

ÇÎROK

ÇÎROKÊN KURDÎ

KURMANCÎ

Bihara 2017 an

ÇÎROK

[Agirê sinema amûdê](#)

[Ardû](#)

[Ax Dayê](#)

[Balafira Jînê](#)

[Balûlka Şekirê](#)

[Bavê Nazê](#)

[Bexçeyê Peyamber](#)

[Bexçeyê Vîşne](#)

[Çiroka Newrozê](#)

[Çîrokên hezar û şevkê](#)

[Çîrokên klasîk ên zarokan](#)

[Çîrokên malpera Çira](#)

[Çîrokên malpera Nefel](#)

[Çîrokên rengîn](#)

[Çivîkên Beravêtî](#)

[Epîlog](#)

[Girtî](#)

[Gopalê Sor](#)

[Gurî](#)

[Hêsir û Baran](#)

[Hingê](#)

[Kadîna Mişkan](#)

[Keça Kurd Zengê](#)

[Keskesor](#)

[Kevoka Spî](#)

[Masîgir û masîya zêrîn](#)

[Memê û Eysê](#)

[Mirina Tewratê](#)

[Mîrzayê Biçûk](#)

[Mişka pişikê ra çawa şer kirin](#)

[Moa û Pelle](#)

[Nêçîra Rovî](#)

[Pêlava Birîndar](#)

[Pexşanname](#)

[Peyamber](#)

[Pilindir](#)

[Pûtvan](#)

[Qaqlîbaz](#)

[Serok û Sokrates](#)

[Şevên Zengîn](#)

[Sî çîrokên bijare](#)

[Siwarên Êşê](#)

[Smirnoff](#)

[Som Cîhan Roj](#)

[Tilûrê Bêgane](#)

[Tûrikê Çirokan](#)

[Xweyî û xulam](#)

[Zarokên Nexwestî](#)

AGIRÊ SINEMA AMÛDÊ

Wesanên Jîna Nû

M. AHMEDE NAMI

Agirê sinema amûdê

Weşanên Jîna Nû:

12

Çapa yekemîn: Ilon 1987

ADRES:

Jîna Nû Forlaget

Post Box: 240 12

750 24 Uppsala

Postgiro: 503799-9

ISBN: 91970747-99

Seydayê Namî

Namî, meji nameya te zanî

Seydayîji bo melay Xanî

Cîgerxwîn

Mele Ehmcd Namî (Mele Ehmed Mehmûd Ebdela) saJa 1906 li Kurdistana bakur, h gundê Erbetê (nêzî Nisêbînê) hatiye dinc Hm ew biçûk bû, bavê vî çû rehmetc. Li gor Seyda li ser mirina bavê xwe, paşiyê ji zarokên xwe re digot "ez h ber mirina bave xwe ketim, çimkî şekir didan min " , diyar dibe ku bi çûna bavê, temenê Seyda 3-4 salî bû. Lê h gor gotina Scyda ew pir bi minna diya xwe êşiya, lewra hingc deh salî bû. Berî mirina dê, temiya wî li metikê dike û jê re dibêje ku Ehmedo bê xwendm mehêhn.

Metika Seydo gotina dê h erdê naxe û Ehmedê sêwî dide

xwendm. Paşiyê Seydayê Namî, dadikevc bin xetê binxetê Li gundê Telşeîrê li ba Şêx Ibrahîm feqîtiya xwe didomîne Dûre bi çendekî diçe ba Sêx Ehmedê Xiznawî, h wira jî demekê dimîne. Gava feqîtiya xwe tamam dike, h gundc Tilşeîrê dibe mele û li wira jî dizewice.

Di vê demê de dan û standinên wî bi Mîr Celadet Bedir-Xan re çêdibin. Loma jî di vê pêlc de Tilşeîrê dibe wargehek kuiturî, civakî û siyasî. Gava Seydayê Namî dibistana keçan h gund vedike, şêx û melên herêmê êrîşê tînin ser, ji mirîdcn xwe re dibêjin "Namî konê şeytên h ser girê Tilşeîrê vegirtiye. "Ji bex-tiyariya Mele Namî re, wê demê axayê gund Eliyê Ebdê, paş-mêriya Seyda dike, şêx bi mirîdên xwe re polî-poşman vedigerin. Paşî vê bûyerê, kevaniya Seyda bi lome jê re dibêje "Çima te ev qiyamet anî serê me! Te mekteb vekir, lê zarokên me yên xwendinê jî tune ne! "Seydalê vedigerîne û dibêje: "Zarokcn kurdan hemû yên min in..."

Di dcmek wilo de dijawariya vekirina dibistanê di vê bûyerê de jî diyar dibe. Dibêjin piştî ku Seydayê Namî bi zorê kurê gavan xist dibistanê, gavanê belengaz h ber dîwêr rûnişt giriya û nifir kirin: " Heger tişteke bi lawê min bê, bira xwedê ji Mele Namî re nehêle!..."

Li gor gotinên zarokên Seyda, di destpêka salên pcncî de, mala wan ji Tilşeîrê radibe, bi tamamî li bajarê Qamîşlo datîne. Li vira Mele Namî xebata xwe ya edebî, siyasî û civakî didomîne. Ew heya dawiya jiyana xwe li qamişlo dimîne, sala 1975-a piştê nexweşiyêke dirêj, Seyda Namî serê xwe datîne û li goristana bajêr tê veşartin.

Seydayê Namî sê eserên nivîsî li pey xwe hiştibûn. Ji wana

"Dîwana Rista" sala 1986-a bi awayê broşurekê di bin navê "Daxwazname" de li Stockholmê hat weşandin. Li gor pêşgotina Seydayê Namî bi xwe ya di wê dîwanê de nivîsiye, pirê ristên wî hatine qetandin û windakirin. Tenê tiştên ku xelkê ji ber kiribûn (paşê Seyda ji devê wan kesan nivîsandibûn) yan jî ew ên ku di Hawar û Ronahiyê de hatibûn belav kirin. Bi çî awayî eserên Seyda hatin talankirin, wî bi xwe di pêşgotina ristan de nivîsiye. Tiştê ku em dikarin lê zêde bikin ev e: Dibêjîn ku Seydayê Namî her car ji tirsê polîs berhemên xwe li malên gundî û cîranan vedişart. Carekê, gundiyekî nivîsandinên Seyda di turekî de h ber zikê axur veşartibû. Piştî pêlekê, Seyda tê wan dixwaze. Dema li tûrik dinêrin, dibînin ku çêlckan cûtiye.

tiştêk tê de nemaye. Seydayê belengaz polî poşman û bi dilşikestî vedigere malê.

Herçî eserê Seydayê Namî yê duduya; Agirê Sinema Amûdê, ev pirtûka ku niha di destê we de ye.

Li Bajarê Amûdê bixwe du şewatên bi nav û deng çêbûne. Sewata pêşî, di salên 30-î de, dema ku balafirên Fransizan Amûdê bombe kirin, bi bombardimanê bajar hate şewitandin. Tevî ku daniştwarên Amûdê mîna hemû gelê Kurd, di wê demê de rûpelên lehengî di dîroka şerê serxwebûna gelên Suriyayê de bi xwîna xwe nivîsandin jî, lêbelê pozê dîrokvanên ereban neçewitî û gotinek li ser vê têkoşînê nenivîsandin û herçî milletê Kurd jî wek hercar hemû tiştê xwe, çî edeb û çî dîrok be, dispêre hişê kesên ku bûyerê dibîhîzin an bi çavê xwe dibînin. Loma ji piştî mirina van kesan bûyer jî bi wan re dimire.

Şewata sinema Amûdê, ya duduya ye ku bi destê dijmin li

vî bajarî kewimiye. Ev li gor şewata pêşî ne pir dûr e. Hîn bi hezaran kes hene, ku şewata sinemê bi çavê xwe dîtine. Heya nihajî şopên vê bûyerê li Amûdê mane. Ev, berî her tiştî "park" a ku li şûna sinemê hatiye çêkirin û danîna heykelê ku bûyc sembola şehîdbûna zarokên bajêr û Goristana Amûdê ye, ya ku bi qûçên ji kevirên şehkirî hatiye xemilandin.

Tevî waha jî, heger hîmê bîranîna şehîdên me, tenê ev tişt bin, ewê tim û tim tirsawindabûnê li ser wan habe.

Lê ji bextiyaariya me re, dema şewata sînema Amûdê, Seydayê Namî nivîsek bi awayê roportajeke firch li ser vê şewatê dinivîse. Bi çapkirina vî eserî, şewata zarokên Kurdan di dîroka milletê wan de ciyê xwe digre.

Eserê Seyda yê sisiya jî, Ferhengoka Kurdî-Erebî ya bi navê "Kozar" e. Ev, hîn nehatiye çapkirin.

Seydayê Namî ji ber têkiliyên xwe yên bi Mîr Celadet Bedir-Xan re di kovarên Hawar û Ronahiyê de jî nivîsiye, di van kovaran de ciyekî aktîf girtiye.

Wek xebata Seydayê Namî ya civakî û edebî, xebata wî ya siyasî jî berbiçav e. Di vî warî de kurê Seydayê Namî, di nama xwe de waha dinivîse: "Ji bilî xebata torevanî û zanyariyê, xeba-

teke bêwestan di tevgera azadîxwaz a milletê Kurd de kiriye.

Ji destpêka Civata Xoybûnê, wî têkilî bi endamên wê re danîye û xizmeteke berbiçav, di vî de jî kiriye. Wî tu carî xwe durî xebatqa millet û tevgera wî nekir, ji bo wilo çend caran kete zîndan... "

Bavê Nazê

10

PEŞBERIYA ÇIROKE

Dema min dît ku çîroka Agirê Sînema Amîdê yek ji serpêhatiyên mezin ên ku di welatê me de çêbûne tê hijmartin, min nexwest ew jî wînda; bê ser û şop herc.

Bi hezaran çîrok û serpêhatî di welatê me de çêbûn û nehartin nivîsandin. Mamoste û pêzanên welatê me guh nedane tiştetekî ji wan, çi mezin û çi biçûk.

Mamoste û zanayên welatê xelkê tiştê li welatê wan dibû biçûk û mezin bê kêmayî di rûpelên mêjû de didane ber çavê zana û xwendevanên xwe û zana û xwendevanên biyanî bi camêrî û serbilindî, nedihîştin tiştêk di ser wan re bibûre û nenivîsandî bimîne. Mamoste û zanayên me, xwediyê xameyên çalak û namîdarên mêjû yên mîna: Qadî Ibn Xulekan û Ibn Al-Esîr û Ebû Al-Fîda û her wiha ristevan û torevanên me yên ku li cihanê deng dane; wek mîrê ristevanan Ahmed Şewqî, Cemîl Al-Zehawî û Mearûf Al-Resafî hebûne. Lê ewan carek mîlet û welatê xwe ne anîne bîra xwe, her û her bi navê mîletên din xwe dane nîşandan û naskirin û ji wan re xebatên hêja û bê hîjmar kirine. Mîlet û welatê wan bê par mane, carekê ji kerema xwe re ne gotine em Kurd in û gelê cihanê bi gel û welatê xwe agadar nekirine, eger biviyanî dikaribûn herkesî agadar bikin bi wan.

Metelok dibêje: "Zilamek û zimanek" ango: zanakî welat

11

û olperest bi xameya xwe zimanekî mirî ji neyînê aniye heyînê û jîndar kiriye.

Va niha em dibînin ku welatê wî zimanî ketiye rêza welatên cihanê ên mezin û ji herkesî bê minet bûye bi mal û dewlet.

^ Ji wan peyayên fidakar û zana û hinermendên ku zimanê miletê xwe bi xameyên xwe, ji mirinê parastine û jîndar kirine, yek jê jî Firdewsî bû. Çiko zimanê Farisî hindik mabû winda bibe, di bin hukmê zorkeran de, eger ne ji Firdewsî bûna.

Her wiha zimanê Erebi mîna wan zimanên windabûyî ew jîbê guman winda dibû, eger neji Quran û edebiyata wê bûna.

Bi sedan sal di bin destê Dewleta Osmanî de ma û dixwestin winda bikin lê nedikarin.

Bi vî rengî, gelek zimanên din di nav pêlên zimanê zorkeran de heliyane û winda bûne.

Weharenge Kurd bi zimanê xwe ve bindestiyê gihandibû pileyên dawî ji windabûnê di nava pêlên zimanê biyanî de ji lewra seydayê tek û tenha, rêberê xîretşînas, pêxemberê rast û durust, derya xîret û dilovanî û mehrevaniya wî hatiye coşê û xwestiye gemîya jîna welatê xwe bighîne bendera jînê.... bi mêranî û hinermendî daketiye meydana xebatê. Bi destekî zengilê jîna welat girtiye hejandiye û bi destê din xameya çalak girtiye û kiriye qîr û gazî û gotiye:

Sa[^]i tû j'i bo Xwedê kerem ke

Yek cureyê mey di camê cem ke

Da cam bi mey cihan nima bit

Herçî me iradeye xuya bit(l)

Wer dixuye ku seydayê Xanî di wan dem û dewran de bê pişt û penah bû, bê hevrê û heval bû, bê xwedî û Xwedan bû. Eger ne welê bûna bê guman ewê hinerên mezin û tiştê nerxgiran nîşanî nîştimanê cihanê bidana. Her wekî gotiye:

Ger dê hebûya mejî xttanek
Alî keremek letîfû danek
Min dê elema kelamê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn(2)
Metelok dibêje: "Destê bi tenê deng jê nayê".
12

Seyda tenê bû lê dîsa dengê seydayê olperest, welatperwer
û nemir giha eywana Kesra û milkê Dara.
Ji wê rojê ve ta îro torevan û ristevanên Kurd bi deng û awa-
zên naqosa rêçenasê Kurd hişyar bûne, dest avêtine xameyên
çalak û dane ser rêç û şopa wî rêberê hinermend û bûne peyre-
wên wî.

Torevan û ristevanên Kurd her tim mazeya peyala aşqê bi
navê Seydayê Xanî danîne û dideynin. Bi seda dîwanên rista
ên welatperwerî û evînî nivîsîne.

Lê heyf û mixabin ku pirê wan dîwanan neketine destê me.
Çiko berê bi tîpên destnivîs dihatin nivîsandin lewra ji wan gelek
winda dibûn û ew jî ji nebûna çap û çapxana û ji bindestî û
jariya gelê Kurd bû.

' ' Zilamek û zimanek' ' yekî mîna Seydayê Xanî yê nemir bû
layiqê pesn û supasan.

Birano! Du tişt bûn ku ez bivênevê kirim ji bo nivîsandina
vê reşbelekê:

1- Tiştên ku me di serê pêşberiyê de got: Ditirsim ev serpe-
hatî jî weke yên demên bûrî winda bibe.

2- Roja dawî piştî şewata sînemê ku çûm Amûdê li wê, li ber
belediyê xortekî xwenda û dilbirîn pêrgî min bû û rojbaşî da

min. Çavên wî ji hêstir û fermîskan weke du pila sor bûbûn.

Ji min re got:

-Seyda ma qey wijdan e ev serpêhatiya mezin weke serpêhatiyên demên bûrî bê nivisandin di ser me re bibûre, ma ne şerm û fihêt e?

Tenê ez hinek sekinîm û di bersîva xwe de min got: "Da ez binêrim ezbenî".

Dema vegeriyam malê, wê şevê ez gelek li gotina wî xortî fiki-rîm û min xwe bi xwe berpirsyar kir û got:

-Eger ez daxwaza vî xortî pêk neyînim bê guman ez gunehkar im, çiqas li gorî min barekî giran e jî. Dawî min xwest ku çend rûpelan bi vê serpêhatiyê reş bikim. Ger çi wê li cem nezan û dijmina bê nerx be, ji ber ku dilqirêj, bextreş, çikûs û şîrheram ji cihanê kê m nabin.

13

Birano! Ev tişt bûn ku ez bivênevê kirim ji bo nivîsandina vê çîrokê.

Paşê min got, divê li gor zanîn û dîtina xwe çend rûpela pê reş bikim û wê reşbeleka biçûk bi navê: "Agirê Sînema Amûdê" pêşkêşî xwîşk û birayên xwe yên xwendevan û xoşewîst û xîretşînas bikim.

U ji wan hêvî dikim ku bi çavên biratî û dilpakî lê binêrin, ne bi çavên meznahî û neyarî. U ji kerema xwe kêmahîyên wê jî bi xameya dilovanî dirist bikin. Çiko ez ne ji wan nivîsevanê xwiyaî me: Xwediye xameyên namîdar im.

Xwîşk û birano! Tiştê ku di çîrokê de hatiye gotin pirê wan min bi çavê xwe dîtine û yên din jî rastgoyan ên bawerpê bihîs-

tine. Çiko çar roja li pey hev diçûme Amûdê û êvarê dihatim mal.

Min pêşberiya çîrokê dirêjkir hêvî dikim hûn li min negrin, çiko xameya min hinek serî ji min sitandiye, bê gem û hevsar xwe daye pêş.

Paşiyê yên mayî scrê we ji me re sax be û dem û çaxê we bi xweşî û şadî û bextiyarî bin.

Bi azadî û kamîranî bijîn xwîşk û birayan.

Namî

(I)Mem û Zîn, Ahmedê Xanî, Rûpel 13

(I)Mem û Zîn,

Rûpel 16

14

BINGEHE SERPEHATIYÊ

Bingehê serpêhatiya çîroka Agirê Sînenna Amûdê, arî-kariya gelê Cezayîr bû.

Her kesî bihîst, ku gelê Cazayîr dest bi şoreşa sala

"1954" a kir, tek û tenha dakete qada şer û agirê şoreşê li çar goşê welatê xwe pêxist. Pêtên wê dilê dijmin sota.

Bi jin û mêran ve bi fidakarî derketin ser serê koh û çiyar ji bo welatê xwe ji penc û kulabê sitem û zordariya dewleta Firensawî azad bikin.

Wî çaxî pir nebûrî dengê şoreşa gelê Cezayîr li rojhilat û rojavayî cihanê belav bû, hate bihîstin. Roj bi roj şer di navbera gelê Cezayîr û dewleta Firensawî de diwartir dibû.

Gelê Cezayîr xwest, ku dara azadiyê bi xwînê, bi comer-dî av bide, lewra dara azadiyê fêkî nagre, bê avdana bi

xwînê.

Pir nebîirî herçî dewletên azadîxwaz bûn bi her awayî dest bi arîkariyê kirin ji gelê Cezayîr ê şoreşger re, nema-ze dewletên Erebb, dewletên haştîxwaz û sosyalîst.

Ji wan dewletên Erebb, ên arîkarî kirin yek jê jî dewleta
15

Sûrî bû (Di dema yekîtîya Sûrî û Misrê de bû).

Sûrya ij dewletên din, ji destpêka şer heta roja azadiyê, arîkariya xwe sal bi sal zêdetir dikirin. Di sala 1960'î de dîsa dewleta Sûrî weke salên berê dest bi civandina arîkariyê kir. Bajar û gundên welatê Sûrî hemî tê de beşdar bûn. Her wiha bajarê Amûdê jî dest bi civandina arîkariya sala nû kir.

Ji nû ve giregir, rîsipî û berpirsiyarên Amûdê civînek kirin û piştî guftûgoyên bawerpê, bajar kirin çend beş:

- 1- Dewlemend û maldar.
- 2- Karker û cotkar.
- 3- Tacir û dikandar.
- 4- Xort û keçên dibistanan û feqîr û jar.

Piştî çêkirina çend komik û malikan ji bo civandina pera her yek ji van li gor kar û karîna wan bêşa wan nîşandan. Paşê berpirsiyarên bijartî roja din dest bi civandina pera kirin. Gelê bajêr bi serbilindî û dilxweşî pêşberiya civînkaran dikirin, bi vî awayî kes nema ku di vê qencî û arîkariyê de beşdar nebû.

Her wekî me berî niha got; dewlemend, maldar, jar, karker, tacir, cotkar, bipîş û bêpîş, dîndar û bêdîn, dilşad û xemgîn, giş beşdar bûn.

Dewlemend û maldarên mezin bi hezara Lîreyên Sûrî dan. Ji wan kêmtir bi seda Lîre pêşkêşî civînkaran dikirin, pile pile ta ku gihîştibû yek Lîre. Ew jî ji hinek xwendevan, feqîr û jaran bû.

Tenê civandina pera ji xwendevana bi destê mamostayê dibistana bû. Dîsa jî her yek li gora hebûna halê bavê xwe ji Lîrekî heta 25 Lîre yê Sûrî arîkarî dikir.

Piştî ku bajar xelas bû ji civandina arîkariyê bi têkrajî, rij sipîtî û camêrî, ji nû ve hinek xeyalên nû hatibiin bîra hinekan û ew bûne sebebê ziyana mezin.

16

BIRHATINÊN MUDÎR

Piştî civîna mezin a bajêr, mudîrê nahiyê rêkir pey mamostayên dibistanan, wan H cem xwe kom kirin û ji wan re got:

-Gelî mamosta tişteke hatiye bîra min ezê bi we bişêwirim ka hûn çi dibêjin?

Yekî ji wan mamosta ji mudîrê nahiyê re got:

-Fermo bibêje.

Mudîr ji wan re got:

-Ez dixwazim rojekê sînema "Şehrezad" kirê bikim û kara wê jî bidim ser perê ku berê hatiye civandin ji bo vê arîkariyê.

Dema mamostan gotina mudîr sehkirin tevan sipasî wî kirin û razîbûna xwe bi temamîjê re dan nîşandan li gotin:

-Daxwaza te pir hêja il rast e, çawa tu ferman bikî bira wiha be.

Mudîr ji wan re got:

-Madam wiha ye îro her yek ji we ji zarokên dibistana xwe re bibêjin, ku divê her yek ji wan sibê roja yekşembê bira çarîk Lîre nîrxê bilêta sînemê ji mal bîne û bê dibis-
17

tanê û ji wan re baş bidin zanîn bêjin: Ev çûn bivê nevê yê, kesê pera neyne ij neçe sînemê êdî ew nema tê dibistanê. Piştî mudîrê nahiyê guftûgoyên xwe qedandin, mamostayên dibistanan veşeriyên dibistanên xwe û ji xwendevanên xwe re tiştê ku bûyî dane zanîn.

Feqîr û jar û dewlemend û maldar di nîrxê bilêta sînemê de mîna hev bûn; her 25 qurûş bûn, lê gelo ma ev tişt gerek bû yan na?

Çiko zarokan û bavê wan berî çend rojan arîkarîk ji vê mestir kiribûn.

Evê din çibû? Kesî ev ne got..!!

Çima ku yekî dilxwaz û dilsoj di wê civînê de ne bû.

Dema zarokan fermana mamostayên xwe bihîstin tevan bi hev re gotin "belêemê sibê perabînin û herin sînemê".

Roja din roja yekşemba bêqidoş 13'ê Çirya Paşîn a sala 1960'ê Mudîrê dibistana Xezalî xwendevanên xwe ij dibistana Mutenebî nîvro civandin, di nav wan de jipiya sekî-nî û gotarek bi hiner pêşkêşî wan kir, got:

Ey birayên ciwan û xwendevan, ey xortên Kurdê comerd hûn baş dizanin ev çend sal in birayên me yê Cezayîrî xwîna xwe ya paqij dirêjin li hember dijminê xwînêrêj, ji bo azadî û serbestiya welatê xwe.

U ez baş dizanim ku gelê Kurd miletekî azadîxwaz û xîretşînas e û dijminê imperyalîzm ij kevneperesta ye, ji

bo vê yekê gereke her yek ji we li gor karîbûna xwe her tim arîkariya wî milletî bike û her ii her jî we kiriye. Gelê Cezayirîrobêhtir muhtacîçekû malejîdestên comerdên azadîxwaz.

Birayên xoşewîst! Ez bawerim ku hûn dizanin me îro sînema Şehrezad kirê kiriye da weko kara ku ji wê bê bidin ser a ku berê hatiye civandin ji we û dê û bavê we. Ev jî dîsa serbilindiya we ye, çiko careke din hûn tev beşdarî 18

vê arîkariyê bûne.

U bizanin ku ev arîkarî ne tenê h cem me, belkî li nav her milletê comerd û azadîxwaz çêbûye û çêdibe.

Ji bo vê yekê ez hêvî dikim niha ku hûn diçin mal her yek ji we çarîk Lîre nîrxê bilêta sînemê bi xwe re bîne û bê, da bi hevalên xwe re here sînemê. Ê ku neyne û neçe sînemê bira baş bizane ku ew êdî nayê dibistanê, eger ew kurê kê be jî.

Mamosta dîsa got:

"Ma we sehkir?"

Xwendevanan bi hev re gotin:

-Belê mamosta me sehkir.

Lê mixabin ku mamosta di dawiya gotara xwe de zor-kotekî da nîşandan ji xwendevana re ku ew çend gotin ne gerek bûn. Divabû mamosta wan gotinên dijwar û tal di wê babetê de ne gota.

Lê em çi bikin ji xelkê re qencyên me her û her winda ne!.. Nakevin ber çava û gelek caran qencî dibin xirabî.

Piştî gotara mamosta xilasbû, xwendevan belav bijn,

her yek çû mala xwe bi lez û bez hin ji kêfa sînemê û hin ji tirsî gotina mamosta. . . Zarok bûn, wer bawer dikirin: Kesê pera neyne û neçe sînemê nema tê xwendegehê ' ' . Dema gihiştin mal her yekî ji dê û bavê xwe re got: Dayê... Babo divê hûn çarîk Lîra nîrxê bilêta sînemê bidin min da ku ez jî bi hevalên xwe re herim sînemê. Eger neçim sînemê, mamosta wê min ji xwendegehê derîne. Ji ber vê yekê çûna min bivê nevê ye. Gişa ev ji dê ij bavê xwe re gotin.

19

DU BIRAYEN SEWI

Xwendevanên dibistanan, wê rojê biroj çûbûne sînemê, tenê xwendevanên dibistana Xezalî û Mutenebî mabijîn. Çûna wan ketibû dema êvarî.

Di nav van xwendevanan de du zarokên sêwî, jar û perîşan hebûn ii bavê wan ê xwa lê xweşî çûbû rehetê, tenê diya wan xwedîkîra wan bû. Ew jî weke heval û hogirên xwe çûn malê cem diya xwe û jê re gotin:

-Dayê gereke îro her yek ji me çarîk Lîre nîrxê bilêta sînemê bide, da ku em jî bi hevala re herin sînemê, eger tu pera nedî me û em neçin sînemê wê me ji xwendegehê derînin.

Dema dayika dilovan van gotinên giran û dijwar ji herdu zarokên xwe bihîst çend kovan û keser hatinê, kûr û dirêj li zaroka nêrî û got:

-Kurê min ez bigorî û qurbana we bim, ez dikarim çarîk Lîre bidim her yekî ji we, lê hûn dibînin dinya bûye êvar, hûn dê kengî herin û kengî bên.

Ditirsim hûn zû neyên û bibe şev. Hedana min nayê.
Tenê dixwazim îşev neçin sînemê sibehî herin. Dayika
20

xoşewîst û dil li bal baş dizanî ku çûn îro ye ne sibê ye.
Ya duduwa, dayê destevala bû bê pûl û pere bû. Bi vî
hawayî tu çare ji zarokê xwe nekir. Zarok jî bi bersîva diya
xwe kelegirî bûn û gotin:

-Dayê gereke pera (nirxê bilêtê) her yek ji me bide û
dayin bivê nevê ye.

Herdû bira bi hev re dest bi girî kirin. Dema dayika dilo-
van û reben dî ku dilopên hêstira û ruhnika ji çavên wan
bi ser ruyê wanî sor û sipî de digindirîn, ji nû ve derya
dilovanî û mehrevanî ya wê keliya, fûriya ij fermîskên germ
ji çavên wê jî dan dûv hev û herikîn di nav pêlê girî bi şewat
de. Got:

-Kurê min, hûn çire digrîn, ma qey rast e çûn bivê nevê
ye? Yekî ji herdû bira çavê xwe paqij kir û got:

-Belê dayê tu dixwazî mamoste me ji dibistanê derînin?
Mamoste wer gotiye, çare nîne.

Dayikê li kurê xwe vegerand û got:

-Kurê min madam wiha ye di saxiya xwe de ez nahêlim
ku ji bo pera hinek we ji dibistanê derînin, wekî ez lihêfa
xwe jî bifroşim. Kurê min pere h cem min nînin lê va ji
we re her yek firaxek savar bibin sûkê bifroşin û bidin nir-
xê bilêtên xwe tj bi hevalên xwe re herin.

Dema zarokan ev gotin ji diya xwe bihîstin herdû bi hev
re çijne destê wê maçkirin û jê re gotin:

-Dayê bira tu ji me ra sax bi.

Dîsa yekî ji biran ji diya xwe re got:

-Dayê tiştê ku di riya qencî ij arîkariya azadiyê de bê xerc kirin ew ne xisar e belkî kar e. Mamostan wilo em hîn kirin.

Dayê jê ra got:

-De bira kurê min, dayê bi goriya te be, aferîm kurê min. Wer dixuyê ku azadî li cem te gelek bi nirx e û qîmet

21

giran e. Bijî azadî û bimre bindestî û koneperestî. Kurê min berî her tiştî yekîtiya paşê fedakarî ye. Dîsa dayê got[^]
Rast e azadî pir şêrîn e "ji lewra ez tim dibêm: Zarokê xwe her tim bi şêrê wê xwedîkin:

Bi azadî biçûka bidne zanîn

Bi şêrê wê xwedîkin rengê dayîn

Nejîn hûn bo mirin, bimrinji bo jîn

Bi azadî bijîn her tim kurê min(l)

Baş meyzekin û binêrin li vê dayika xoşewîst çi qiymet daye azadiyê û çawa rêç û şopa jîna serbestî nîşanî zarokên xwe dide.

Dayîk di her tiştî de zana bû, tenê totaka kezîkur û reben û bextreş ne dizanî, ku ev çend guftijgoyên şêrîn di navbera wê û herdû şêrîne ber dilê wê de guftûgoyên dawî ne û herdu kur wê herin di riya çûn û nehatinê de û dîtina wan dîtina dawî ye.

Diya wan bi dilşadî û xweşî xwarina wan danî ber wan.

Piştî xwarinê her yekî firaxek savar kire kîsê xwe û wê êvarê birin sûkê, firotin, bi wan pera her yekî bilêteke sînemê kirî ij kete nav heval vj hogirên xwe.

Êdî hew li diya xwe vegeyriyan, bûne gorî û qurban ji bo azadî û serxwebijnê.

Bira herkes bizane,

ku milletê Kurd çawa dikare bi

comerdî û fidakarî bi dost û hevalên xwe re bi can û mal bike û ji te re vê jinebiya bêkes çawa fidakarî bi herdû firaxên savarê xwe kir. Bi ser de, comerdiya mezintir bi canê herdû ciwanên xwe kir û herdû kirin qurban û gorî ji bo azadiyê.

(I)/i ristên Namî

22

AVAHIYA SINEME

Dixwazim li vir hinek bi kurtî pesnê avahiya sînemê ji xwendevanên xoşewîst re bidim.

Bi rastî sînema ne sînema bû, rengê axurê dewara bû, tenê çend kursî, motor, elektrîk û şaşe tê de danîbûn û jê re digotin sînema. Eger ne ji van çend tiştan biina ew bi kêrî axurê dewara dihat. Dîwar ji kelpîçê axê bûn, banê wê direk, texte û pûş bûn, herwekî avahiyên dewra berê yê gund bû. Kursî dar û qiram bûn, modêlê kevnare ji yê zemanê berê bû, her çar dîwar ji hundir ve bi telîsê rengîn bi boyaxê û bazotê perdekirî bûn.

Dirêjî 18 mètre, firehî 6 mètre, bilindî 4 mètre bû. Deriyê wê yê yekane bilindî 2 mètre û firehî yek mètre bû. Cîgehê motorê herwekî dibêjin du mètre nebû û di nava wî û banê sînemê de ew jî dep û dar û pûş bû. Lê dîsa ji her tiştekî gerekir divê em baş bizanin ji van tiştan re kî ber-

pirsyar bij?

Çawa bihêlin xaneke dewara bibe sînema?

Gelo sûc û gunehê kê bij?

Nizanim...! Nizanim...!

23

Deriyê pêkê ecelê: Deriyê sînemê

24

VEGERA XWENDEVANAN JI MAL

Êvarê careke din kolan ij cadeyên bajêr hatin dagirtin û pêl ketin wan ji xwendevanên dibistana Xezalî û Mute-nebî. Bir bi bir kewt û gêş berê wan li dibistanê bû weke berê, ji wê de bi rêz û edeb wê herin sînemê.

Nêzîkî rojava, xwendevan giş li hewşa dibistanê li hev civiyan û ji wê, berêxwedan sînemê. Demadighîştin, rasterast berê xwe didan kuleka ku bilêt lê têne birîn, da ku her yek bilêta xwe bibire. Bi vî hawayî dem bû piştî mux-ribê; rê ij rêgah li kolanan nema, bi şadî û xweşî li lîstgeha sînemê dileyîstin û çavnêriya seet şeş ij nîvê êvarê; dema destpêka film dikirin.

Bi xoşxan û sinidan diçiin û dihatin. Wê şevê çend kesên din ji xelkê bajêr jî ji bilî xwendevanan bi zarokên xwe re hatibûn. Lê mixabin wan jî nedizanîn, ku mirina sitemkar û bêbext konê xwe yê reş; konê ecelê li ser sînemê vegirtiye û di kêrangiha wê de li ber xortên ciwan kemîn daniye, daf û qoç û xefikên xwe di derî û pencere û şibakên sînemê yên teng de vedane.

25

Seet bû nêzîkî şeş hêja yek yekên xwendevanan ji çar

aliyê bajêr dihatin, ta ku hejmara wan gihabû nêzîkî 500 kesî.

Navê film wê rojê; "Gunehkariya Nîvê Şevê" bû. Navekî bêqidoş bû, bêqidoşiya wî ji nav tj nîşana wî dihate zanîn.

Di wê seetê de xwendevan wek pêlên derya ji kêfxweşî û nêzîkahiya destpêka film li hev diketin. Lê wan jî qet bawer ne dikir, ku ber bi mirinê ve diçin û dawiya jîna wan e. Ji lewra wan jî xatirê dawî ji dê û iaavê xwe ne xwestibûn mîna herdu zarokên sêwî. Ewan xatirê dawî ji diya xwe ya dilovan xwestibûn û ji nû ve hatibûn.

26

ZENGILE SINEME

Saet bû heftê êvarê. Pir ne bûrî bi awaz û deng bû çingîn û zingîna zengilê sînemê. Xwendevan her yek ji cihê xwe êrîş bire sînemê. Di deriyê yekane re, deriyê teng û tîrş, cote cot bi zor di ber hev re derbasî hundir dibûn. Êdî ne hewce ye ez careke din pesnê derî ji we re bidim. Weharengê bi xir û cir xwendevan hemû ketin sînemê. Lê di hundir de halê wan bû çî, nizanim.

Di wê gavê de zana ij bîrewer di nav wan de ne bîin, ku nerazîbûna xwe ji berpisyarê sînemê re bidin nîşandan, ji ber wî cihê teng û tal. Eger dilsoj û xemxwarek hebûna, bê gûman ew ziyana mezin çênedibû.

Hikim berdî berdayî bû. Kesî guh li kesî ne dikir, berpisyar ne dihatin naskirin. Tenê çend mamostên biyanî, ne yê dibistana Xezalî ij Mutenebî û cilwazekî belediyê yê ku bi zarokê mudirê nahiyê re hatibûn, cihê wan xweş

ij fereh bîn.

Xwendevan dîsa di gel wê tengayî û nexweşiyê, bi dil-
şadî çavnêriya vemirandina ronahiyê li hilanîna perdê ji

27

ser ruyê şaşa sipî dikirin.

^ Paşî derî hate girtin bi 'çil hejê guhîjî' bi destê mirina
bêbext û sitemkar.

28

DESTPEKA FILM

Dengji zarokan hate birîn, hêdî hêdî perde ji rijyê şaşa
sipî hat hilandin û film destpêkir weke carên berê. Tîrê-
jên ronahiyê çine şaşa sipî. Piştî ku hinek ji film kete ber
çavan û derbas bî, ji nişka ve yekî bi dengê bilind kire
gazî ij got:

Hewar e gelî zarokan û xelkê sînemê, bazdin, bire-
vin, sînema şewitî !

Pê re pê re dîtin, ku tîrêjên ronahiyê hatin guhertin bi
tîrêjê sorî agirî. Ji nû ve hemîyan bawer kirin, ku sînema
dişewitî û ew deng û gazî dengê peykê ecelê ye.

Êdî her yek ji cihê xwe rabii ij êrîşî devê derî kir da ku
bireve û xwe ji mirinê biparêze, xilas bike.

Berî herkesî mamoste û cilwazê belediyê yê bi zarokên
mîidir re hatibû, bê zehmetî di devê derî de derketin û ez
bawer im wan qet agir nedîtin wek ên mayî. Çiko dema
wan dengê şewatê bihîst, hêdî hêdî derî vekirin li bê zeh-
metî derketin. Li dû wan çî kesên kursiya wan nêzîktirî
derî bij, ew jî bi xweşî derketin.

29

Dema agir hinekî dijwar bû, bi çavê tirsê, her yekî ji tirsê şewatê û agir dixwest xwe bighîne derî û xwe ji mirinê xilas bike. Bîste bîst dane ser hev, bi ser hev de bûn kom ij derî hate girtin. Paşê hinekan xwe ji locê di pencera re avêtin û hinekan ji pencera yekane di dîwarê jêrî yê sînemê re xwe avêtin derve... Lê sed heyf û mixabin ku li wê jî mirina bextreş daf û qoçên xwe li ber dîwarê jêrî, li hember pencera niivekirî veda bûn. Li ber wê bîr hebû û deriyê wê vekirî bû. Gelek zarok dema xwe di pencerê re davêtin derve, yekser diketin bîrê, ew bîra ku me go li ber dîwarê sînemê yê jêrî bû. Wan pê nizanîbû, ê zanîbî jî, çavê tirsê bii, nedihat bîra wî.

Dema xelkê bihîst, ku zarok ji pencerê xwe davêjin derve û dikevin bîrê, ji çar aliya êrîş birin devê bîrê ji bo deranîna zarokan. Ji wan jî hin sax hin mirî tanîn der. Ên ku di sînemê de mabûn ji diikel û pêtên agir, derî û pencere li ber wan winda bûn. Edî bazdan û rev bi dest wan nediket û ne dighan derî. Ê ku digha jî di derî de asê dima.

Pir nebûrî dengê bi tirs û gurmîneke xurt ji hundirê sînemê hat. Bingeh û dîwarên wê hejiyan, te digo belkî bombeke atom di hundirê sînemê de teqiya.

Li dûv teqînê agir girte ser û binê sînemê îî ji pêlên dû hundir tarî bîi... Pêtên agirê sor û şîn, çar alî, çep û rast zarok li hev vedigerandin. Çendî gazî hewar dikirin bê fede bû. Gelek dê û bavê bextreş ji wan bê guman bûn, newqî derya xefletê bûn. Di wê gavê de xeberdarekî dilsoj mîna Gurgîn nebû da ku xeberê bighîne Tacdîn. Ji lewra gelê Amtjdê ta ebed sergerdan û jar û xemgîn maye:

Dilo jaro ji xew rabe
Ji derdê milletê xemgîn
Me Tacdîn û Çeko nînin

30

Xeberdarê me bê Gurgîn(I)

Hin bi hin pêtên agir dijwar û bilindtir dibûn, rengê
şîpa aş di derî, kulek \i pencerê re tavêtin. Kesî nema dika-
rîbû nêzîk bibe, yên dihatin, didîtin, ku agir bi wî rengî
ye, naçar disekinîn, mîna Zerdeştîyan li dor agir diçûn û
dihatin ij didîtin bê çawa pêlên agirê sor û şîn bîste bîst,
çile çil xortên ciwan di kûrangîha sînemê de didin ber sin-
gên xwe.

Weke rifdek gurê Kanûna, birçî, bikeve koza berxa ya
bê şivan û bê xwedî. Ji wan hin diketin û ranedibîn û hin
radibûn dîsa diketin. Bi yek dengî digotin: Yadê. . . Yabo. . .
Hewar e. . . Ez şewitîm, ez peritîm. Bi vî rengî qêrîn û hewa-
ra wan, di nav pêl û pêtên agir de bi renekî mijsîqî awaz
û deng dida. Lê yadê û. yabo, xwîşk û bira, metik û xaltîk,
ap û xal, pismam û dotmam ji wan dûr biin û dengê wê
mtjîsîqa bi şewat nidikirin.

Metelok dibêje: ' 'Xwediyê taJanê dengê hewarê nake. "

(I}Ji ristên Namî

31

GAZI U HEWAR

Piştî ku sînema bû deryak ji derya agir, ji nû ve deng-
dar û dengbilindên bajêr ketin kolan û cadan, kirin qêrîn
û hewar, gotin;

Ey gelê Amîidê; hewar û sed hewar derkevin! Agir

ket sînemê, agir ket koza berxan, koza berxên ciwan, sîne-
ma şewitî! Hey hewar dijmin talanê me bir; talanê bê his
û deng.

Heçî yê ku ev deng û gazî bihîst, çî li mizgeft û çî li dêra,
çî li qewhexana û mala, pîr û ciwan, jin û mêr, qîz û xort,
zerî ij pakîz, weke şêt û dîna, pêxwas û sertazî û bê perde,
mest û sergerdan, bi lez û bez, bi qêrîn û hewar ketin kolan
û cadan. Berê wan li sînemê bû, sînema bêqudoş û kam-
bax. Pirê wan hê jî nizanîbûn çî bûye. Kî pergî kê dibû,
digot;

Hey hewar ev çî agir tj dûman e? Ev çî hewar li gazî
ne:

E dizanî digot, "Agir kete sînemê, agir kete koza ber-
n."xan.

U yên din bê tirs ta dighan qada agir û didîtin, ku agir
32

çiqas dijwar îî bê keys e, ji agirê dogehê jî diwartir e, ew
jî wek ên mayî şaş diman sekinî û temaşeyî pêl û pêtên
agir dikirin. Ne dizanîn êdî çî bikin, dûr dûr diçîn û diha-
tin bi ax û fîxan. Kesî nema êdî kes nas dikir û ne jî êdî
dengdihatbihîstinjibilîdengê; "Weledlawo!" û "Hewar
e yadê!"

Ew ademîzad hemî di bin rohaniya pêtiya agirê sor û şîn
de bi kalîn û nalîn bûn. Bi rastî jî agirekî bê keys bû, tu
hêznebû, ku zora wîbibeii vemirîne. Tenê; "Egerpeya-
lek ji wan fermîsk û ruhnîkê wê şevê ku ji çavên qîz û bûk
û zeriyan hatin werandin û hin ji gufaştina dil û canê dayi-
kên xemgîn bihata civandin û bi reşîneke sazkar û bi des-

tekî dilsoj li wî agirî bihata reşandin, bê gûman ew agir di wê gavê de vedimirî."

Seyda Mela Cizerî dibêje:

"Gazindeya ji kê kim, ji kê bikim şîkayet."

Agir hin bi hin diwartir dibii, di derî vj pencera re weke şîpên aşa pêl tavêtin. Dayikên dilovan û xoşewîst bi kalîn û nalîn rengê totak û goyîna bê hêl û himet li nav kewt û geşê ademîzadan diçûn û dihatin. Te digo belkî dem axir zeman e. Sed pê li pêkî diket, kesî nema dizanî dinya şev e yan roj e.

Sitêrê gotiye;

azmana vajî digeriyan.

Lew Seydayê Cizerî

"Minqelib min dî kewakib vaji ew seyrê dikin

Yek biyek xwînjê dibarin ateş û lemie û şîhab

Ez dibêm axir zeman e dê qiyamet rabbitin

Lew şeva tarî kişandî ne hişit eswed xurab"(I)

Wer dixiye, di wê demê de pileyê germiya agir ji pile-

(I)Dîwana Cizerî,

rûpel 82

33

yê germiya oksicînê germtir û diwartir bûn. Çiko me berê gotibû, ku tiştên di bingehê sînemê de ji wan tiştê pêxistina agir bûn.

Ji bilî wî tiştî jî di oda motorê de teqîneke mezin çêbû-

bij. Ji xwe ta îro jî ne hate zanîn ka ew çi bîi taqiya. Ji

ber ku zanayê dilsoj û mêrxas nebûn da wekû bingeha van tiştan bikolin. Hin kesan bi gûman digotin ev agirê dij-

war ne vala ye, ji hin tiştên kîmya û kîmyager li wir ne bûn û eger hebîna jî ne dikarîn rastiyê bibêjin.

Paşê yekî ji min re got: Piştî şewata sînemê bi rojekê muhendisekî kîmyawî hatibû û temaşa tîrekê sînemê yê hesin kiribû û gotibû:

Ev hesinê qalind ne bi renekî hêsanî xwar bûye, xwarbûna wî ne vala ye ji hin tiştên kîmyawî.

Gotina muhendis ne vala bii. Lê weke me gotî, nikarîbii ji wê zêdetir bibêje. Ew jî wiha ye. Çilo pêl û pêtê wî agirî ji pêl vj pêtên agirê Neron ê li Roma bilindtir û diwartir û ji pileyê germiya agirê Nemrîid û Brahîm Xelîl germtir bû.

Dijkela agir ber bi jor de riyê ezman bi renekî reş îtarî nixûmandibij. Te digo belkî ewrek ji ewrê tavana heyva nîsanê ye, ji diirya sed kîlometrî xuya bû.

Wek Seydayê Xanî gotiye:

"Ewrek te digoji erdê rabû

Evrazî li asiman civa bû

Wî ewriji nîvika hinava

Xwîn barî dikir bi herdû çava"(I)

Ji nîvê şevê pê de di bajêr de kes nema. Jin û mêr, biçûk

(I)Mem û Zîn,

rûpel 75

34

û mezin giş hilweşiyar dora sînemê, mest û sergerdan diçûn û dihatin, seyr ij temaşa pêl û pêtiyê agir dikirin.

^ Piştî ku şahneyê qedayê peykê ecelê penc û kulabê xwe yê tewend, nêçîra nixgiran ji nişka ve ji xwe re bir û çû,

ji nû ve dê û bav, dotmam û pismam newqî deryaya derd
û xema bûn, herkes dismala wî li dest bû ruhnîkên çavên
xwe paqij dikirin. Ew ruhnîkên mîna tavana ewrê heyva
nîsanê diweriyan ser xakê sînemê.

Herçî te didî bi qêrîn ij hewar bû, weke kesê ta girtî bi
ricf û lertzîn mîna neya nav avê bê vîn li hev digeriyan û
qêrîn û hewarên qîz ij xort û zeriyan dighan çerxa felekê.

Seydayê Xanî dibêje:

"Bê perde misalê ney dinalî

Ruhnîk diwerin ela etewalî

Çawa te digofeslê nîsan

Derya rijîya ji ewra dîsan

Cindî û sipahî û emîran

Derwêş û reiyet û feqîran

Dildar û şepal û nazenîna

Hûrî û perî û xemrevîna

Vêkre dikirin hewarê herkes

Fîxan dighane çerxê etles.

35

Bîra ku zarok ketibûnc.

36

MIHEMEDÊ XWA LÊ XWEŞÎ

Dibêjin hêj destpêka agir bû, lê hin bi hin pêtiyên wî

dijwar dibûn. Koma ademîzadan hewara agir, jin û mêr
li hev sitûr dibûn.

Me dî ji wê koma bêjimar xortekî ciwan li hêja, huner-
mend û canpola, mêrxas û xîretşînas; "Mihemedê kurê
Seîdê Deqorî" derket. Peywend û zincîrê jîne qetandin,

weke şêrekî xeyidî û teyrekî bazî ku xwe berde ser nêçîrê, êrîş berda kûrangiha agir, kiirangiha mirinê; hundirê sînemê, ta ku gihîşt zarokan û ji wan dido dan bin çengê xwe û anîn der. Cara duduwa dîsa êrîşê hundir kir û du zarokên din anîn der.

Bi vî hawayî êrîş li dû êrîşê ta ku donzde zarok ji kûrangiha mirinê, ji nav pêlên dogehê anîn der.

Lê sed mixabin, di êrîşa cara dawî de agir girte cil li canê wî. Ji ser ta bi qedem ew jî bû pêtek agir û sînema bi carekê de hilweşiya, bi ser wî ij zarokên mayî de hate xwar. Hedan neket canê wî ta ku bû qurban ji bo lawanê miletê xwe.

37

ihcmedê kurê Seîdê
zarokji agir deranîn

38

Ji kevnare de dibêjin çî kesê mal û canê xwe di riya fedekariyê de bide, her tim rûpelên mêjûyê jê re vekirî ne.

Ey Mihemedê Xwa lê xweşî. . . tû û hevalên xwe siparî dilovanî û mehrevaniya Yezdanê pak bin.

39

HATINA AGIRVEMRINE

Ji nû ve agirvembrîna Qamişlo gihabû Amûdê. Weke rasta li ber birkanê agir sekinî û narpêça xwe dirêj kir û av reşande agir. Lê piştî çî ? Her tişt derbas bû! U sînema btjbii weke îtûneke bihurtî. ..

Xwezîka agirvembrînê ew alîkarî nekira, Bê gûman reşandina avê di wî wextî de li ser agir ziyar bû ne kar bîi .

Çiko dema zarok ji nav komira agir û heriyê derdixistin pirê wan goşt li ser hestiya nemabû û hin jî qalikê serê wan teqiya bû û hin parçe parçe ne tamam derdiketin. Ji vê dihate zanîn dema av li agir hate reşandin pilê germiyê zêdetir bûn. Berê şewat bij, paşê bi avê hatin kelandin.

40

DENGE ELLAH U EKBER

ÛDENGÊ NAQOSA

Dengê Ellah û Ekber îî dengê naqosa ji nivê şevê ve nehate birîn. Dengdarê mizgeft û camiya bi bang û selawat û zengil û naqosê dêr û kenîsa bi çingîn û zingîn bûn. Bi awaz digotin

Ka şîna ji vê mezintir gelo?

Rojê peravê xwe avêtin dinê, avêtin ser serê koh û çîyan. Hêjî ew ademîzad mest û sergerdan bê hiş û bîr li dor birkanê dojhê wek heciya li dor Keebê û Berê Reş, yan jî wek agirperestên ku li dor agirê Zerdeşt diçûn û dihatin, heta roj hilatê; roj hilata çardehê çîrya paşî ya sala 1960'î. Ji nû ve herkesî bawerî anî bi cûdabûna ebedî û destê xwe ji delalên dilê xwe birîn.

Ji lewra Seydayê Melayê Cizerî gotiye:

"Firaqê şev bi axir çû

Sipêde kifşe bû dîse

41

Merîxa nehsi ava bû

Xuya bû roj di şerqê de(l)

Berî rojhilatê agir daixemirî, bi sedan otomobîl ji çar aliyê Cizîrê dihatin Amûdê. U bê jimar însan siwar û peya di

riyan re wek şopa gêrik û mîrowan ji gunda dihatin hewara agir û talana bê his û deng. Wisa bû, ku di kolan û cadyên bajêr de rê nema.

(1) Dîwana Cizerî, rûpel-46

42

VEDANA SINEME U DERANINA

LAŞA

Piştî ktjrha agir hinekî cemidî, dest bi vedana sînemê û deranîna laşê şehîdan, xortên ciwan û nîi hatî kirin. Leşker û serdar û rîsipî û berpirsyar, weharengê kar-ker û cotkar li vedana kûrangîha sînemê û deranîna laşa peydar bûn.

Di demekî hindik de ji bilî ax û heriyê pê ve di hundirê kaviî sinemê de tu tişt nema, lê di nav çar dîwarê reş û şewitî de hê jî hilm û dûkel ji ax li heriyê bilind dibû.

Di wî wextî de kesî nedikarî bihnekê xwe bigre ji bihna kizirandina goştê şewitî.

Dîsa jî xelk bir bi bir diçûn û dihatin, di hundirê sînemê de li heriya ax û xwîn û goştê şehîdan temaşê dikirin û her yek li gor nazikiya dilê xwe tavek (tavanek) barana rondikan ji çavên xwe dibarandin ij derdiketin derve.

Mego demalaşê şehîdan bi tamamîderanîn, ji wan hin derdiketin û dihatin naskirin zû zû dê û bavê wan didane ber sînga xwe û dibirin mal. U hin jî dîsa derdiketin lê bi reng û nîşan nedihatîn naskirin. U hin jî parçe parçe

43

derdiketin mîna parçên komirê, yan jî weke parçên goştê berxa di firinê de bête biraştin, ewê wilo rast û rast dibi-

rin mizgefta, dişûştin û kefen dikirin. Ê hin hebîn laşê zarokê xwe nedidîtin, careke din dihatin û diçûne mizgefta û li nav laşa digeriyan. U hin jî bi sol û qondere, hin bi parçek cilê wan dihatin naskirin. Dîsa dê îi bavê wan dibirin mal. En mayîn ku nehatin naskirin, herwekî me gotî ew ji mizgeftan rast û rê dibirin goristana mezin bi hevalên wan re bê kêmayî dihatin veşartin.

Lê ya ji her tiştî diwartir dîtina wan perçe goştên biraştî bû. Aqil û sewda di serê mirovan de nedima. Pêtî û agir digirtin dilan, bê çare ji kerbê ziyana mezin û nerxgiran ruhnik mîna barana dijwar ji çavan diweriyan.

Ez bawer im kê mî mal man ku yadîgarek ji van yadîgaran neçûye.

Dema bîi danê peza, piştî vedana sînemê qediya û tişte tek nema, hêj nîvro ne bûyî, gor bi temamî hatin kolan. Çiko ji rojhilatê ve bi hezaran ademîzad çûbûn ser tirba ji bo kolana wan.

Piştî şehîd bi temamî hadn şûştin û kefenkirin û nimêj li ser wan hate kirin, ên li mala û ên li mizgeftan, ji nû ve herkes ma çavnêrî rakirina laşê şehîdan û çûna ser goristanê.

44

45

ÇUNA SER GORISTANÊ

Roj bii nêzîkî nîvro. Serê darbest û tabûtên xemilandî çile çil ji bajêr derdiketin û di bin dengê Allah û ekber û dengê naqos û zengilê kenîsan de berê xwe didan goristana Amîidê ya mezin.

Wî çaxî te dinêrî kolan û cade ji însana pêl didan û darbest û tabût li ser serê ademîzadan weke gemiya di nav pêlên derya de diçûn goristanê. Dema te dinêrî li telp û komên mirova, bi çek û pêçên reş di ber darbest û tabûta re bi awaz û deng, mest û sergerdan rengê totak ij goyîna bi nalîn û kalîn digotin û dibilandin.

Bûk û ciwan, perî û zerî, pakîz û nazdar ji rengê xwe yî gulî ketibûne rengê pîr û kalan... Çavên wan ji fermiskên xwînê tarî ij sor bûn, nedikarîn êdî pê li pê bikin ji derd li êşa delalên dilê xwe xortên ciwan.

Wê rojê dihate zanîn û bawerkirin ku li Amûdê qiya-met rabûye... Sed pê li pêkî diket, ji qêrîn û kalînên ademizadan pê ve tişte ne dihate bihîstin. Û ew jî ji germiya dil û canê dê û bav ij miletê wan bû.

Ruhnik, hestirê xwînê co û cobar li rûdêmê herkesî, bi
46

taybetî li rûdêmê keç û bûk û xatûna vekirîbûn.

Bi wî rengî gîhane goristanê di bin siya ewrekî tarî de ku mîna ewrên tavana heyva nîsanê xwe berdabû ser bajarê Amûdê.

Ji lewra Seydayê Xanî gotiye:

Gava ko cenazê wan hilanîn

Şahid ko ji Meşhedê deranîn

Meşhûdî biwîn li wan elamet

Rabû li xelaiqan qiyamet

Hindî ko di şehrê ademi bûn

Têkde di libasê matemî bûn

Hindî ko hebûn di şehrê meşhûr

Xatûn û muxederat û mestûr
Neyah û mehrevan û dayîn
Goyende binale şibhê goyîn
Telpê reşê wan siyah û poşan
Reh şubhetê ewrekî xeroşan
Ew çendîji aridê digel gûn
Vêkre diwerin sereşkê perxûn
Goya ko difesla nûbuhare
Baran e li gulşenan dibare(l)

Di demekî pir hindik de 280 xortên ciwan ên bi heyf
û nestêle destê xwe ji dê û bavê xwe kişandin û her yek
di cihê xwe yê dawî de serê xwe danîn ser balgihekî axî,
razan bi razaneke bê hişyarî. Digel derd ûêşû birînên xwe,
dê û bav, pismam û dotmam bi şûn xwe de hiştin ku new-
qî deryaya derd û xeman bûbûn.

Dayîk û bavê xembar her yek li ber tirba delalê dilê xwe

(1) Mem û Zîn,

rûpel 119-120

47

48

rûniştine dikalin û dinalin, dibêjin û li xwe vedigerînin.

Ey ruhniya çeşm li dilê dayika pepûk û reben. Ew gazî
îi hewar ku te di nav penc û kulabê ejdehayê agir de digot:

Yadê heware, yabo heware! Nayên jibîrakirin ta ku bim-
rim û bostek giya li ser sînga min bê banî.

Ew deng û awaz ji guhê min dernayên.

Dayê gotinên te tev rast in derdê te derdekî pir giran
e lê ji te re bîna fireh gerek e.

Dayê tiştê çîi.. çû..ji îro pê de min ne êşîne.

Kurê min pêtiya agirê sînemê di can û cegerê min de ye, derdê kezebê derdekî giran e, kezeb bê fedî û fihêt e, gazinan ji min mekin.

Dayê ez dizanim pêta agirê dilê te pir dijwar e ji pêta agirê sînemê hêj diwartir e, heqê te ye gazin ji te nabe. Dayê birînên min gelek dijwar in, hedana min nayê. Bes-ke negrî, dema tu digrî birînên min dişewitin ij dilê min dibuhure, lew dibêm dayê negrî, bihêle da ku hinek derd li êşên xwe ji bîr bikim.

Kurê min, ruhniya çeşm û dilê dayika pepiik tj reben. Kalîn û nalînên te, ber û latan dihelînin, te ez şêr û dîn û mest ij sergerdan berdame cîhanê. Aqil ij sewda di serê min de nemaye, megrin.

gazina ji min mekin, çî bikim li min

Kurê min tu dibê dayê megrî! Çawa negrîm dayê bi gorî! Te diya kire evdal li derê dêr tj mizgeftan heta mirinê û heqê min şev û roj ax û xweliyê bi serê xwe werkim. Delalê ber dilê dayê, bihnekî çavê xwe veke, meyzeke û baş binêre, li dora te hemî xwişk û bira, dotmam û pismam, heval û hogirên te ne û bi sedan pakîz û zerî, xatîin û perî, bi hezaran biyanî kal û ciwan, mamosta ij xwendevan. . .Bi ser we de bi kalîn û nalîn in û fermiskên xwînê ji çavê xwe

49

bi comerdî dibarînin. U herçî dayikê, cîhana rojhilat û rojava bi dayika te re bi giryan û şîn in.

Çawa negrîm kurê min? U tu dibê dayê tu negrî!!
Kurê min ez dê çawa sebirkim, cihê sebrê li cem min
nemaye. Nema karim pêta agirê çûn û dijriya te hilgirim,
xwîna dilê dayika te hatiye coş, can ij cegerê min û ruhni-
ya çeşm û dilê min.

Lew Seydayê Cizerî gotiye û dibêjî:

Tu narêfirqetê zanî

Nikarim ez tehemil kim

Diyari Kohê Qendîl im

Megerfîl im di eşqê de

Zehê derdê mezinfirqet

Ceger sot ateşî da dil

Cihê sebrê nema çendan

Ferec min dî di sebrê de(l)

Çi kesê ew hêvî û zarî û bersivên dayika dilovan dibi-
hîst bê hemd wek ney û nay dihejiya, dikalî û dinalî. U
fermiskên germ ji çavê xwe paqij dikirin.

(1) Dîwana Cizerî, rûpel 54

50

Zarokckî ku ji agir .xilasbû,

li xoşxanê razayî ye.

51

REWŞA TIRBA

Gorn bi vî hawayî bûn:

Ji hinan her yek di gornekê de û hin jî dido dido, ên
ku birayê hev bûn di yekê de hatin veşartin. Paşî gorna
mezintir 13 yan 16 zarok ên ku parçe parçe bûn ij ji hev
nedihatî nas kirin, piştî ku kirin çend kefenkîsan, têde

veşartin.

Paşê, ji bo çêkirina tirbên wan xortên ne nas çi gerek bû hate kirin da weku ew xort jî bê kêmayî bibin weke hevalên xwe yê bi xwedî. Çiko herkesî tirba zarokê xwe bi kevirê birî li kêlê şekirî çêkirin û li ser her kêlekê nav û nîşan û jîndariya wan hate nivîsandin.

Tu li kîjan aliyê goristanê bifitiliyayî hemî komên dayikên xembar bûn. Her yek li ber serê tirba delalê dilê xwe niniştî bû dikewgirî bi nalîn û kalîn ruhnîkên xwînê ji çavên wan diweriyan ser axa tirban. O her roj wiha bû, weka roja heşrê kesî kes nas nedikir, sed pê li pêkî diket. Qêrîn ij hewarên wan dighan çerxa felekê.

52

ÇI ÇU U ÇI MA

Li gor hijmar û gotina agadaran, ên ku ji sînemê derketin li ji agir hatin parastin du sed û hinek bûn.

Mamosta û cilwazê belediyê û zarokên mîidîrê nahiyê ku nezîkê derî rûniştî bîin, ji wan bûn.

U li dû wan hinên din di derî de derketin, paşê hinekan xwe di pencera re avêtin derve. Ji wan jî hinek ketin bîrê herwekî me berê gotî, hin jî birîndar, nîv şewitî derdike-tin, zû zû pêre pêre dibirin xojxana Qamişlo. Ji wan jî hin mirî vegeriyan bi ser xwediyê xwe de. U hin jî sax bûn û vegeriyan mala xwe weke nîi Xwedê ew dane dinyayê. Wek vî xortê ku hûn dibînin.

U ên ku di kûrangiha sînemê de man û hatin biraştin 280 bûn. Ew bûn şehîdên arîkariya azadiyê û serbestiyê. Eger em baş bifikirin, agirê sînema Arhijdê, li welatê

Japon bîrhatina serpehatiya Hîroşîma ye.

Çima?

Çiko gelê Hîroşîma bi tîrêj û çirûskên bomba atomî hate biraştin. Lê ziyana gelê Amiidê du mil bû: Şewat û temar bû.

53

54

Yekji xortên şewitî li xoşxanê ye.

55

Ji lewra em dibên çîroka sînema Amûdê çîroka Hîroşîma tîne ber çavan û dide nîşandan.

Çi kesê li bingeha çîroka agirê sînema Amûdê agadar be, bê goman ewê ji ber arîkariya gelê Amûdê serê xwe ji wan re nizm bike.

Çiko her tim arîkarî bi mal tê kirin. Lê wan arîkarî bi can û mal kir... Dû sed û heştê xortên ciwan kirin gorî ij qurban ji bo gelê Cezayîr ê azadîxwaz.

Bira dîsa herkes bizane ku gelê Amûdê bi zendên pola ala comerdîyê li gumbita banê gerdûnê dan çikandin.

56

SERXWEŞIYA GEL

Piştî nîro herkes ji ser goristanê vegeriya bajêr, ji nû ve weke cejna qurbanê xelkê bajêr ketin kolan û cadan.

Ji malekê diçîin malekê ji bo serxveşîya dê û bav û mirovên şehîdên agir. U beşdariya xwe bi zîrar û ziyana gelê Amîidê re didan nîşandan.

Te dinêrî ser û binê kolana dagirtî biin ji tirimbêla ên ku ji bajar û gundên Cizîrê hatibûn hewara agir.

Bi vî hawayî heta nêzîkî rojava bê sekin li mala digeriyan, çî kesê biyanî wê şevê vegeyriyan malên xwe ên bi tirimbêl û ên bi piya yan siwarî.

Em jî hatin mal wê şevê. Bajarê Amûdê ma vala ji kesên biyanî... Bajarekî bê his û deng û xemgîn û xelkê wî bi giryana û şîna man di bin hesara leşkerê derd û xeman de, ta fecera sibehê.

Ji sipêdê pê de dîsa dengê Ellah û ekber ij çingîn û zingîna naqos û zengilê dêran destpêkir.

Bi awaz û deng: Şîna...şîna...şîna...

Ne tenê bajarê Amûdê wê şevê di bin hesarê de bû, belkî bi hezaran dilê pîr û ciwan û zerî û periyana di bin hesarê de bûn.

Her wekî Seydayê Cizerî gotiye:

Leşkerê qehr û xeman

Wî çûn hisara dil bikin

Keabe û beyt elheram

Lê bi nûr bitin receb (1)

Roja dm, sibeha 15'yê çiriya paşî sala 1960, dîsa em hatin Amûdê di gel çend hevalan ji bo serxweşiya ên mayî. Ez bawer im wê rojê çûn û hatin di kolanê bajarê de bihtir bû ji roja berê.

Wê rojê dîsa weke roja berê berpirsyarê dewletê hatibûn ji bo serxweşiya yêna mayî, tenê gera wan wê rojê li malên xuyayî û dewlemenda bû. Dema berpirsyara dî ku bi vî hawayî kar naçe serî, çêtir ew e çend giregirek û rîsiyên bajêr ên bijartî rûnên li ciyekî xuyayî û li wê pêşberiya kesê ku têne serxweşiya gel bikin.

Bi rastî ev bîrhatin di ciyê xwe de bû. Û weke hat gotin çend rîsipî rûniştin û pêşberiya xelkê biyanî û ên dihatin serxweşiya dikirin bi navê hemû xelkê şehîdan.

(1) Dîwana Seydayê Cizerî rûpel-74.

58

HATINA

BERPIRSYARAN JI

BO

SERXWEŞIYA GELÊ AMÛDÊ

Ji nû ve wê rojê berpirsyarên Cizîrê hatin ji bo serxweşiya gelê Amîidê. Piştî çend gotinên serxweşî û biratî, yek ji wan rabû ser xwe, gotarek bi navê xwe îî hevalên xwe îî bi navê gel ji bo serxweşiya civîna biyartî û gelê Amiidê yê dilbirîn pêşkêş kir û got:

"Ey birayên hêjaûdilovan û dilbirîn. Ev ziyanamezin ne tenê ziyana we ye, belkî ziyana me teva ye. Bêhtir ziyana gel e.

Ji ber vê yekê ez ji we hêvî dikim ku hiin bi çavê qederê li vê ziyana ha binêrin. Paşê bila serê yên mayî ji me re sax be. U ji yezdanê mezin hêvîdar im ku xelefê li we vegenne.

U rûnişt.

Ji gotinên wî mirovî yên dawî dihate zanîn ku çîrok ne vala ye lê wî camêrî dixwest perdekê bigre riwê çîrokê û nehêle bîn jê bê.

Paşê di wê civînê de çend tişt hatin gotin û xwestin ku ew jî bîne cî û pêt bîn:

59

1- Sînema û xakê dora wê bibe bustan û ziyaretgah ji bo gel heta hetayî.

2- Herî û axa bi goşt û xwîna xorta hatiye hevîrkirin li cî bimîne.

3- Mînakek (peykerek-heykelek) bi regekî zanyarî bê çêkirin û di nîvê bustanê de bê çikandin û danîn.

4- Çi arîkarî bê civandin, ew pere û arîkarî berî her tiştî wê li mînak û bustan bê xerc kirin da ku bibe bîrhatin ji bo gel ta roja dawî.

Civîna roja didijwa bi wî awayî dom kir.

Evarî careke din em vegeriyan mal. Roja sisiya 16'ê heyvê dîsa em hatin Amîidê, heta nîro em li mala geriyan û jê pê ve ez û çend hevalên xwe yê dilbirîn çûn cihê sînemê; sînema kivil û kambax. Mîna îtûneke daxemirî bi dûkel. Em li ber dîwarê wê sekinîn bi rêz û bê his û deng nixwîn ij mest û sergerdan. Me li ziyana nerxgiran temaşa dikir û em difikirîn. Yekî ji hevala ji min re got:

Seyda çima deynakî!

Bi rastî wê çaxê xwîna dilê min hatibû coşê, ev çend malikên rista mamostayê nemir, Pirta Begê Mîrê Hekarî hate bîra min. Bê vîn min ji wan re pêşkêş kir û got:

Me dil bû ateş û nîrane dîse

Cegerjî tiji min biryane dise

Neşê m êdî ewan derdê we bê hed

Bikêşim lew bi zerb û jane dîse

Ji xeyrî daxê xem nîne dewayek

Go serda derdê bê derman e dîse

Dilê min kaseya serpoşî Dara

Tijî derd û xem û kovan e dîse.

Pir ne bûrî yekî ji hevalan got:

60

Gelî hevalan bes in da em herin, ez nema karim xwe bigrim. Ji wê em vegeriyan piştî ku her yek j[^] me peyalek fermîskên xwînê ji çavên xwe barand bê vîn. Edî me nema dikarîbî ji wê bêtir em bimînin.

Wê rojê baranek xurt bariya. Bê goman ew baran wê rojê fermîsk û ruhnîkên asmana bûn bi rengê rehmetê bariya ser tirbên şehîdan.

61

DADESTI U XWEDÎ SINEMÊ Û HOSTAYÊ

Roja pêşî ku sînema şewitî, berpirsyarê bajêr şeş kes girtin û danîne derbendîxanê. Sisê jê xwediyê sînemê bûn weke[^] Xidirê Ezîz, Silêmanê Remezani û Ehmedê Hesenat[^] U sisiyê din hosta û şagirtên sînemê bûn weke: Ehmedê Ibrahîm, Mihemedê Mehmûd û Ehmedê Şerîf

Roja dawî her şeş li dadgehê pêşberî dadestî kinn rêz û sekinandin. Dadestî ji wan re got: Hiin guhehkar in û tawanbar in ji bo vê ziyana mezin.

Çima?

1- Çawa hûn dihêlin 500 kes bikevin cihê 170 kesî?

2- Çawa hûn sînemê bê agirvembrînk dihêlin?

3- Çima dergehê sînemê yek bû û çima biçûk îî teng bû?

Gerek bû bi hindikayî 2 derî di sînemê de hebûna ji bo çûn ij hatinê û derketinê.

Ji ber ku sînema ne bi renekî rast hatibû avakirin ew bixwe avahiyeke ku kêmehiyê wê pir bûn. Her tiştê di ava-

hiyê de giş ên şewatê bûn, heta bi kursiyê wê ango ji dar
û dep û pişş bûn.

62

Ev kêmayîyên hebîin bîine gunehkarî ji we re. Lê divê
hûn dîsa bizanin ku beledî jî beşdarê gunehkariya we ye.
Çima?

Çiko her tim divabîi beledî we gerek bike ji bo pêkanî-
na kêmahiyên wê her dem û çax.

Gunehkarên berpirsyar li hember serekê dadgehê sûc
û guneh ne dane ser xwe û di bersiva xwe de gotin:
Ezbenî, ustad û mamostayê qanûn û dadestiyê; tiştê bûyî
ne sîjc û gunehê me bû. Yan emê bêjin qeder bû, yan
gunehkar û tawanbar xeyrî me ne. Tenê em perîşan û jar
in, newêrin ji hewqas zêdetir bibêjin. Ji ber vê yekê em
hêvîdar in ji dilpakîya we, ku berpirsyarî hê ji vê firehtir
bike, bê goman hingê wê rastî di riya xwe re serbest bibû-
re. Dîsa em hêvî ji serekê dadgehê dikin ku bi dûrbîna heqi-
yê li me û vê ziyana nerxgiran hûr û kûr meyzeke û bi
şahîn û peyana dadestiyê bikêşe û bipeyive. Çiko di gelek
ji van tiştan de zor li me hatiye kirin ij em di kirina wan
de bivê nevê bûne. Nêzîk ne dîir, rastî wê bê eşkere kirin,
Xwedê arîkar be.

Ev bûn gift tj goyên dadestî û tawanbaran...

63

GUNEHKAR Ê TAWANBAR KÎ NE ?

Li her civat û civîn û qehwexanên bajarê Amûdê gotin
û mijilî ev bîin:

Ev şewat ne bê sebeb bû ! Lê gelo sûc û gunehê kê bû

? U berpirsyar kî ne?

Hinan digot stjc li gunehê mudirê nahiyê bû; çiko berpirsyarê mezin di bajêr de ew bîi. Her tiştê dixwest karîbî bike.

Ji ber vê yekê gerek bû agadarê her tiştî biwa. Çawa dihişt sînema ku ji 170 kursî pêkhatî bî, bihêle 500 kes bikeviyê.

Wer xuya btj her kursiyek du yan sê zarok tê de rûniştîbîin. En mayî şipiya mabûn. Di cihê wilo de çawa çend polîs nebin da ku gohdariya nîzamê bikin. Bi rastî eger çend polîs li wê hebûna ew ziyana mezin nedibû.

U hinan digot: Na, siic û guneh ê mamosta û mudirê dibistanê bû! Çima ji herdû dibistanan çend mamoste di nav hewqas xwendevan de ne bûn?

Belkî bi wî rengî û tengayiyê razî nebûna. Belê çend mamosta hebûn di sînemê de wî wextî, lê ne mamosteyên 65

dibistana Xezalî û Mutenebî bûn, ne xemxwar û dilsojê xwendevanan bûn. Ji lewra xemxwarî li wî tiştî nekirin.

Dema agir girte sînemê ewan berî herkesî bazdan û xwe xilas kirin, hay ji hevalan neman û bê şerm û fihêtî li agir temaşa dikirin.

Ez bawer im eger ew çend mamostayên di sînemê de dilsoj bûna, dikarîbûn nîvê zarokên mayîjîji penc îî kulabê mirinê biparêzin.

U hina jî digot:

Sûc û guneh ê hosta û xwediyê sînemê bû. Çima ?

Ji ber ku diva bû her tim guhdarî motora sînemê bin.

Dema dîtî ku motor germ dibe, gerek zû zû vemirandana.

U hin jî dibêjin hosta û xwediyê sînemê hêj bi roj bi ger-
miya motorê hisiya bûn. Dîsa jî heta êvarî kar pê kiribûn.

Ji lewra xelkê digot, sûc û guneh ê wan e.

U ji ber vê yekê mudirê nahiyê zû ferman da bi girtina
wan û xwedî û hosta û şagirt kirin berpirsyar heq ne heq,
di hebixana Amûdê de razandin. Pir ne bûrî sipartin dad-
gehê.

Ev bûn gift û goyên xelkê wan roja di her civat û civî-
nan de. Her yek li gor zanebûna xwe tiştêk digot, rast ne
rast.

66

GOTINA RAST

Lê pir ne biirî ez baş bi wî tiştî agahdar bîim. Roja didu-
w^a ku ez çîime Amûidê, berî nîro em li malekê bîin. Me
dî dîsa xelkê civatê, behsa sîic îî gunehê sersebeba dikin.
Me jî guhdariya wan fikir.

Hinan digot sebeb mudîr e îî hinan digot xwedî îî hos-
tayê sînemê ne. Me dî ji nişka ve xwedîyê malê berê xwe
da civatê îî got:

Gelî civatê, ez vî tiştî baş dizanim. Belê xwediyê sîne-
mê îî hosta zanîbijî germ dibe. Lê di şuxulandinê de bivê
nevê bîin.

Çima ?

^Wê rojê roja yekşembê piştî nîro nêzîkî êvarî ez li malê
bîim, min dî xwedî îî hostayê sînemê hatin cem min. Piştî
ku rîniştin ji min re gotin:

Bavê Şêrgoh, em di bextê te îî Xwedê de ne, mudîrê nahi-

yê niha şiyandiye dîiv me îî dibêje, gereke sînema dîsa bişuxule ta ku xwendevanên dibistanan xilas bibin. Tenê xwendevanên dibistana Xezalî îî Mutenebî mane. Û motor gelek germ dibe em jê bi tirs in.

67

Ji ber vê yekê em hêvî dikin tu herî cem mudîrê nahiyê îî jê hêvî bikî îşev dev ji me berde. Sibehê emê fermana wî bi tamamî pêk bînin, çend caran bixwaze. Min ji wan re got baş e ezê herim.

Piştî ku ji cem min çîin, ez çîime cem serokê polîsa li bajêr îî min çîroka hatina xwediyê sînemê îî hostayê wê îî germbîina motorê jê re got. Min jê hêvî kir ku ew here cem mudîrê nahiyê îî jê hêvî bike da ku xwediyê sînemê bivê nevê neke wê şevê ji ber gerbîina motorê.

Camêr ne go "na" îî hêviya min qebîil kir, çîi cem mudîrê nahiyê, jê re got:

Ez hatime hêviyekê ji te bikim. Hêviya min jî ev e; tîi xwediyê sînemê bivê nevê nekîîşev. Çiko min bihîstiye ku motorê sînema wan gelek germ dibe îî ew ne baş e. Bila îro motora xwe sazkar bikin paşê sibehê tîi çawa bixwazî bira wilo bikin.

Dema wî gilehê xwediyê sînemê bihîst, gelek enirî îî xeyidî. Piştî serekê polîsa ji cem çîi bi hêrs bakir polîsekî îî jê re

got:

Zîi here cem xwediyê sînemê îî jê re bibêje, mudîr dibêje gereke vê carê îî careke din jî îî careke din jî sînemê bişuxlîne îî eger neke ezê karê wî bidim dîtin, paşê bira

gazina wî ji wî be.

E polîs bi lez îî bez çîî îî wilo ji xwediyê sînemê re got.

Pepîik xwedî ji naçarî gote ê polîs;

Belê ezbenî ezê bikim ! Emrê min ji Xwedê re be.

U herwiha ta ku ev ziyana nerxgiran jî çêbîi!!

Ev li cem min heye min ji we re got. Paşê civat sekinî

îî kesî dengê xwe nekir.

Vî wextî zor zane îî bes... vaye niha xwedî îî hosta îî

şagirt berpirsyar in di hebixanan de, dawî em nizanin wê

halê wan çibe.

68

Gelo ji gilî çî derdikeve eger dadeştî nebe. Seydayê Cizerî
gotiye:

Kes bi dade me ne pirsit

Gileh û dadî çiket

Te nebit dadiresek

Beyhode firyadi çikit

Bi Şirînê ne gihit

Destî eger Rustemi bit

Dê bi bazû û milan

Şubhetî Firhadi çikit.

Ez bi xwe yek ji wê civatê bîim îî min guhdariya goti-

nên xwediyê malê dikir. Gelo îcar berpirsyar kî ne?

Dîsa jî em nizanin çiko rastî nayê gotin îî tirs heye. Ez

xulamê wî me yê ku zengil bike stîiwê pisîkê. Çîroka ber-

pirsyariya agirê sînemê weke çîroka pisîkê îî zengil bîi. Sey-

dayê Hejar gotiye:

Ger dadeestî bi heq bête cê

Wiştir bi kunî şûjin de diçê.

Lê bi rastî hindikayî ve divabî çîrok hinek bê hilwejartin
îi bikeve ber çavê xwendevanan îi beyhîde neçe. Dibe ku
hinek berpirsyarên dilpaqij îi welatperwer ên ku her tim
li daxwazên gel îi welatê xwe meyze dikin, nobedar in ji
xweşî îi serfiraziya milletê xwe. Ku carekê ev deng bikeve
guhê wan îi pê agadar bibin.

Çima metelok îi herwekî Seydayê Cizerî dibêje:

"Gazindeyaji kê kim

Ji kê bikim şikayet"

Gelo em li hêviya kê mane ku xemxwariyê li me bike?

Li gilih îi derdê me bipirse îi ji destê zorkotek îi zordaran
biparêze.

69

Qey metelok nabêje:

'Xwerha laşê te bi destê biyanî naşkê ku ne bi destê te be.

70

HATINA ŞANDIYAREKÎ MEZIN

Çend roj bîirîn piştî şewata sînemê, hinek berpirsyarên
mezin hatin Amîidê ji bo serxweşiya gelê wê. Xelkê Amîidê
jî pêşberiyêke mezin ji wan re kirin. Dema gihîştin bajêr
îi bihnekê rehetiya xwe standin, serekê şandiyar rabîi ser
xwe îj çend gotinên bi şewat îi bi dilekî zîz îi xemgîn pêş-
kêşî civînê kir îi got:

"Gelîxuşk îi birayên dilovan îi xemgîn, ev ziyan ne tenê
ziyana we gelê Amîidê bîi belkî ziyana me gişan e, çiko
280 xort şehîdên agir leşkerê ji leşkerê welêt ê demê tê
bîin. U ez ji Yezdanê gewre îi mezin hêvîdar im ku ev ziya-

na ha ziyana we ya dawî be, ji niha îî bi şîln de dem îî dew-
rên we tim bi şadî û xweşî bin îî serê wê ên mayî ji me
re xweş be.

Ey xwîşk îî birayên xoşewîst îî dilgîr, we çend tişt ji ber-
pirsyarên welêt daxwaz kiribîin. Ew tişt bi tevayî li cem
me xuya bîine îî hatine zanîn. Xwedê arîkar be, ew dax-
wazên we bi kêmayî wê bêne cî. Xakê sînemê weke we
xwestî îî hinek ji xakê din jî hawîrdorê wê bidin ser. U
mînakî jî weke we gotî tê de bê danîn, da ku bibe seyran-
71

geh ji we re heta heta hetayî, bustanekî bi dar îî gul, ango
cîgayê şadî îî xemrevînê.

Birayên dilovan ji niha nêzîk ne dîir, hin arîkarî wê ji
we re bîn ji me îî ji hin milletên dost îî azadîxwaz jî. Berî
her tiştî 25 hezar lîre nêxê mînaik wê ji wan pera bê dayîn.
Her wekî berê jî me li cem xwe ev daye zanîn çiko me gotina
xwe bi dewleta Italya re kiriye, ku mînak weke me xwestî
çêkin îî rêkin. Dest bi çêkirinê hatiye kirin. Ji niha îî nêzîk
wê bighê. Dema bighê me emê ji w re zîi rêkin. Hin ji wan
pera wê li çêkirina bustanê seyrangêhê bê xerçkirin. Perê
mayîn li gor zanebîina berpirsyaran îî rîsîpiyê bajêr wê
li xelkên şehîdan bêne parkirin.

Birayan; dîsa bawer bin ez îl hevalên xwe beşdar in di
xem îî şîna we de, êdî bixatirê we."

Piştî xatirxwazî careke din berê xwe da civîna mezin,
civîna jin îj mêra îî got:

"Ey xwîşk îî birayên bi rêz, eger tiştêk ji we re gerek
e ji me re bêjin bê şerm îî fihêtî da ku daxwazên we ji we

re pêkbînin, zîi ne dereng, Xwedayê mezin arîkar be."
Dema serek ev tişt got, yekî ji wê civîna mezin. . . civîna
xemgîn îî dilbirîn rabîi, berê xwe da serokê şandiyar îî jê
re got:

"Ey serekê serbilind û dilpak îî dilovan, eger hîin dix-
wazin derd û xemên me bêne guhertin bi xweşî îî şadî,
35 xortên me girtî di zindana Mezê de hîinê wan ji me
re berdîn. Bê goman bi berdana wan derd îî êşên me wê
bêne jibîr kirin îî weke ku we du sed îî heştê xortên mirî
ji me re rakirin. Daxwaza me ya mezin ji te îî ji hevalên
te ev e. Paşê saxiya te îî hevalên te ji Yezdanê pak dixwa-
zim."

Pêre pêre serek lê vegerand îî got:

"Ser sera îî ser çva. Dema bighim payîtextê, emê wan
72

xortan ji we re berdîn ku gunhê wan çî be."

Bi vî hawayî îî li ser van peyman îî sozan guft û goyên
wan qedîyan. Serek îî hevalên xwe ji Amîidê vegeriyan
Qamişlo îî ji wê suwar bîin îî çûne Şamê.

Bi wan gotinên bîirî herkesî bawerî anî û çavnêrî ber-
dana girtiyên hebixana Mezê man. Lê sed heyf îj mixa-
bin tiştêk ji wan gotina demeket, herkesî gomana xwe birî
îî bê hêvî bîi ji wan peyman îî sozan îî girtî mane di zinda-
nê de.

73

PARKIRINA PERE ARIKARIYE

Piştî perê arîkariyê gihane hev, nêrxê mînak ji wan pera

hate dan îî hin jî hiştin ji bo çêkirina mezargehê, rastkiri-
na hundurê wê, çandina gul îî çiçekan tê de bi rengê sipe-
hî îî xweşik her wekî wilo di civîna me gotî de hatibî gotin.
Û perê mayî, ez bawer im bi hawayê jêrîn hat parkirin
di bin çavdêriya hinek berpirsyaran de:

1- Çi kesê yek zarok ji mala wî çîbîî îî bavê wî kal bîi
ango emrê wî zêdeyî 60 salî bû îî bê pîş îî kar bîi "1000"
lîre dan wî.

2- Kesê yek yan dido ya sê zarok ji mala wî çîbîin îî
bavê wan ciwan û xwedî pîş îî kar bîi, her serê zarokê
"600" lîre didanê, ew jî dilxweşî bîi ji dê îî bavê wan re.
Ez baş ne agadarê vê parkirinê bîim, çiko ez wan roja
ne li Amîidê bîim, ev jî min ji xelkê bajêr bihîstibîi.
Gerek e destê parkirinê bawer pê bê. Ji ber ku parkirin
bi destê civata rîsîpiya îî hinek berpirsyarrên bawerpê bîi.
Bi vî rengî îî hawayî pere hatin parkirin.

74

GULISTANA MEZARGEHE U REW- ŞA MÎNAK

Me go civîna du mil ku ji berpirsyaran îî rîsîpiyên gelê
Amîidê hatibû girêdan, di roja pêşî de têde hatibî gotin:
Gereke cihê sînemê bibe bustan îî mezargeh, mînak têde
bê danîn îî hundurê wê bi hawakî hendesî bê rast kirin.
Gul îî çiçekên reng reng tê de bîn çandin. Da weku rojên
cejn îî şahiyên xembarê xoşewîstê gelê Amîidê, qîz îî xort,
kal îî ciwan lê bicivin îî derd îî êşên xwe bidin ji bîr kirin.
Bi rastî di wê civînê de soza xwe birin serî îî bê kêmayî

tiştê gotin pêk anîn.

Cihê sînema bêqudoş îî parçek ji xakê din jî pêve hebî, ew jî berdane ser ta ku dirêjî rojhilat îî rojava bî 50 mitir. Ferehî jor îî jêr bî 35 mitir. Surhek dîwar ji bilokên çimento dan dorê, bilindaya wê mitrek yan pitir bî û sîrhek ji diryê hesinî li bilindiya dîwarê berê ê kevirî zêde kirin.

A

Paşê dema mînak ji Italya ghişt, wê gavê rêkirin îî şandin Amîidê. Tenê hinek li Amîidê danîna wî bi şîin ket ta ku karê bustan pêk hat. Paşê birin cihê wî li mezargehê

75

îî li ber dîwarê bustan ê jêrî hate danîn îî hate çikandin. Dema dixwazî herî hundurê bustan hêj li ber devê derî mînak dikeve ber çavê te. Mînak bi vî rengî ye: Sê xortên dibistanê di nav pêl îî pêtên agir de pişt wan li hev, ala Cezayîr di destê yekî ji wan de ye îî sekinîne. Mînak ji kanê paxir li Italyayê hatiye çêkirin, nêrxê wî 25 hezar lîre ye.

Eger hin bêjin çima ala Cezayîr di destê wan de ye, bersiv ev e:

Çiko sebebê şewata sînemê arîkarîya gelê Cezayîr bî. Hersê xort îî hevalên wan bîine şehîdên arîkariyê, azadiyê îî serbestiyê.

Her wekî hundurê sînemê bi regekî hendesî par kirin îî kirin malik ji bo çandina gul îî çîçekan; mîna sosin îî beybîn îî rîhan îî jîle îî binefş îî nesrîn îî nêgiz îî lale.

Çend kursiyên kevirî li hember malikên gula danîn.
Tenê di nav malika de rê ji bo çîin îî hatinê hiştin.
Ev car me zanî ku cihê sînema bîi mezargeh îî seyran-
geh ji bo gelê Amîidê ta roja dawî îî bîi gulistan îî guzara
tek tenha îî civîngeha gel di cejn îî Newroz îî seyran îî şahî-
yan de.

76

r

■■■*i

*»wn-

f

Mînakê~xortên şewitî.

77

CIVINA ROJA PÊŞÎ

Civîna roja pêşî li bustan civîna bîrhatina derd îî xeman
e, bîrhatina pêtên agir e.

Ez bawer im ku ew civîn wê gelek dijwar îî zehmet be,
çiko cara pêşî ye herkes wê bi dilgîrî îî çavên giryan, dê
îî bav, xwîşk îî bira, dotmam îî pismam, pîr îî ciwan îî
cegersoj wê bicivin li bustan, li mezargehê; cîgayê bîrha-
tina şewata 280 xortên ciwan.

Nemaze dema ew ademîzad li hember mînak herin îî
bên.

Naçar wê çaxê, deryayê derd îî xeman wê bête coş îj
herkes wê bi gazî îî fîxan îî hewar îî mest îî sergerdan be. . .

Bê hijmar peyalê ruhnik îî fermîskên sor wê li ava bus-

tan îî mezargehê bêne rijandin. Çavên qîz îî zeriyan, ciwan
îî kalan bê his îî deng di nav malikên gul îî çîçekan re li
hev bigerin, bi dismalên xwe hêstirên çavan paqij îî ziwa
bikin.

Ji nîî ve yek yek, dido dido, sisê sisê wê rîinin li ber
masên kevirî îî maze; mêlak îî can îî cegerê sotî ne.
Di wê civînê de Namî yê jar îî birîndar peyalek ji fer-
78

mîskê xwe yî sor pêşkêş bike ji gelê civîna pêşî re.
Civîna ku herkes tê de beşdar bîye, dibêje îî dibilîne:
Peyalek vajifermîskê min î sor ey birader
Bigir xalo didim te vêji abê hewdê kewser
Belê paşê bide yek yek heval û hogirên xwe
Qedeh zeravê neqşê çîn û maçîne ji mermer
Ji çeşmê xwe dibarînim hero sed tavî baran
Wekî dîne li çola şev li min bû ba û bager
Felek zalim dilê xemgîn nedî şadî bi carek
Heta peykê kul û derdaji bo min bûye rêber(l)
Dîsa jî ev ne cara pêşî ye ji sitemkariya felekê re ji bo
vî mîletê xemgîn.

Paşê, piştî vê civîna xemgîn îî bi giryan îî şîn ew roja
ku gulistana mezargehê bi hêstir îî rohnikên qîz îî bîika
îî hîir îî perîya hate avdan îî ji wan xunafek hîir girte riwê
gul îî jîle îî sosina.

Bê guman ew civîn wê 5 deqîqe bimînê sekinî ser nix-
wîn, şîn li ser xortên ciwan... Şîn...şîn...şîn...

Dîsa Namî yê dilgîr dibêjî:

Ey xwîşk îî birayên dilgîr,
Ji Yezdanê gewre îî mezin hêvîdar im ev ziyana ziyana
we ya paşî be îî li dîiv vê ziyane xweşî îî şadî rêber îî hem-
neşînê we bin îî her tim serfîraz îî bextiyar bin.
Hîin ên mayî sax bin.
Ên çîiyî sipartî dilovanî îî mehrevaniya Yezdanê pak bin.

(1) Ji ristên Namî

79

CIGAYE ŞADI U XWEŞÎ

Bustanê mezargehê jiîro pêve wê bibe gulistana şadî îî
xweşî ya bi nav îî deng îî tek îî تنها îî cîgayê xemrevînê
ji bo xembaran.

Bustana mezargehê ger çî bi pîvan îî li ber çav biçîik
e, lê dîsa ji gulistanên cîhanê ên mezin tê hijmartin.

Çiko ji tovê 280 xortê ciwan hatiye çandin. Ji lewra me
gotiye gîilistana tek îî تنها îî bosîtana xemrevîn.

Paşê wê demek bê ku rojên cejn îî şahiyên îî sersal îî
Newrozan dema jîle îî jale îî kulîlk îî gul perda ciwanî ji
ser riwê xwe yî sor bidin alî îî pêşkêş kin, hingê gulistana
Amîidê wê bibe cîgayê geşt îî seyranan.

Her şev îî êvar, qîz îî xort xeml îî xêzê xwe wergirin îî
dest li dest, berê xwe bidin bustanê xemrevîn, bustanê şadî
û xweşî, li nav malikên gul îî kulîlkên reng reng herin îî
bên, bigerin.

Hin caran bi awirên çavan li mînak meyzekin û rûnên
li hember hev, bi şadîmanî li ber tewînê naz îî zerî îî horî
îî periyên.

Saqî kas îî cama li ser desta bigerîne, perîzad îî zerî îî
80

mîrza ii cîwan şekir ji lêvan birevînin îî gula li rewan bici-
vînin.

Her wekî Seydayê Xanî dibêje:

Dinya hemî bûye eyş û iştret

Zalafelekê ji kerb û hisret

Rabû ku vexwan ji ber xewasan

Saqî geriyan bi cam û kasan(l)

Paşê her yekî ji destê gulfîroşan gulekê ji gulê bustan

bistîne îî bide ber pozê xwe da ku ew jî bibe hemdemê bil-
bil îî hevengê sorgul.

Hejar îî Goran mest îî sergerdan îî gift îî goyên şêrîn
mîna Cegerxwîn.

Bi vî hawayî naçar leşkerê derd îî xeman wê di bin piyê
leşkerê şadî îî xweşiyar de bê pelaxtin îî bimre.

Dawiya şevê, şevbiwêrk diqede, disa herkes cote cot gul
bi dest, mîna hatin wê veşerin malên xwe serbest îî azad
îî bi şadî îî kamiranî.

Naçar ev geşt îî seyran îî sersal îî Newroz heta hetayî
wê bibin adet ji bo gelê Amîdê.

Dîsa hêvîdar im ji Yezadnê pak îî dilovan ku şadî îî xwe-
şiyê bike rîzan îî rêber îî hevrê îî heval ji bo gelê Aîimdê,
şevên wan roj bin îî rojên wan cejn bin îî heta hetayî cejn
îî seyran îî sersal îî Newroz li wan pîroz bin.

Dîsa Namî seyran îî Newroza nîi ya gelê Amîdê bi dil-
şadî li gulîstana xemrevîn pîroz dike îî dibêje:

Her sal vi çaxî cejna we pîroz

Cejna welatê şadîman Newroz

(1) Ji ristên Namî

81

Xweşi li zaxa xweşi bilbil

Xweşî li baxa xweşî sorgul(l)

Hewbîi... bi arîkariya Yezdanê pak îî dilovan.

(1) Mem û Zîn rûpel 51

82

ISBN: 91970747-99

**

ARDÛ

ji kurteçîroktn gelêrî

ARDÛ

JI KURTEÇIROKtN GELtRI

Nivisende: Hesenê Metê

WEŞANAN WELAT

Stockholm 1990

Weşan: 3 ARDÛ

Çapa Yekem

© Weşanên Welat

Pergala berg û rûpelan: N. Kirîv Wêneya bergê: Ş. Nemrûdî çap: Nya

Wiking Tryckeri AB [SBN 91-971254-4-X

NAVEROK

Pêşgotin 7

Nexweşî 9

Parsek 15

Aqilfiroş û Aqilkirox 17

Kîjan 23

Ehmeqtirînê ehmeqan 26

Paşa dîn bû an xelk	31
Seyda	35
Hogir	38
Kî çi bike bi xwe dike	.45
Mirina axa	53
Çavnebarî	56
Bîstan	59
Bêhtengî	63
Xortê barxwar	66
Ardû	71
Cixarekêş	74
Mîr û xulam	77
Lê êzingên min	82
Feqiyê li ber bêderê	85
Ga	88
Colek gur	91
Heft kir heştê helandî	95
Jinikek û bûkên wê	97
Kerenga ber bê	100
Ku meriv bixwaze	104
Malşewutîn	107
Poşmanî	111
Qamçûr	114
Revandina qereçîyekê	118
Merivekî saxik	122
Merivê li ber bên	126
Bûka nû	130
Şîna bi ken	133
Xwarineke xweş	136
Sing	140
Têkilî	144
Peyveke rast	148
Xeyalina	152

Xulam 157

Zana û kurê wî 161

Ferzend 165

Împeratorê xesî 169

pêşgotin

Ev pirtûka ku di destê we de ye, ji çel û du kurteçîrokên gelêrî pêk hatiye. Ev kurteçîrokên weha, bê cî û bê sedem nayên gotin. Di civatekê de, di navbera du kesan de dema ku peyv tê ser peyvê, an jî peyv li peyvê disekine, ev kurteçîrokên ha wê çaxê wek argument têne gotin. Bi katkirina van kurteçîrokan, çîrokbêj dixwaze rastiya gotinên xwe bi cî bike û pê peyva xwe rast derxîne. Tişteki herî balkêş jî ev e ku dema xwediyê çîrokê nikare gotinên xwe bi awakî zanetir û nimûnên berçavtir bide famkirin, «Yek hebû» dibêje û dest bi katkirinê dike. Ev «Yek» ango lehengê çîrokê ne bi nave. Lewra rengê lehengên kurteçîrokên weha, bi herkesî dikeve û pirî caran li gelek kesan jî tê.

Her kurteçîrokek kêmasiya hêleke meriv raber dide: Dinitî, ehmeqî, kêmaqilî, sersivikî, saxikî, gêjî û bêhayiya meriv, bi awakî zarxweş raber dide. Lewra wusa diyar e ku ji bo kesekî, gelek dijwar e ku li nav çavên yekî hemberî xwe binêre û jê re bibêje, «Tu ehmeq î.» an jî, «Tu derewan dikî,» Lê dema ku ev tiştê ha bi zar û çîrokeke weha tê gotin, nermtir û

7

xweştir dibe.

Me bala xwe dayê ku ev kurteçîrokên weha li navçeyên cuda cuda, bi gelek babetên wekîdin têne gotin. Derketin û destpêka wan ji deh babetan jî zêdetir in. Lê herçiqas derketin û destpêka çîrokan ne wekî hev bin jî, wekî navarok ji hev ne dûr in û ev jî ji karekerekî edebiyata devkî ye. Loma me jî pêwîst ne dît ku em her kurteçîrokekê bi hemî babetên wê di pirtûkekê de biweşînin.

Di arşîva me de ji devê Şemsedînê Diyarbekirî, Hesênê Mêrdînî, Seîd û Mehmûdê Sêwregî, Ûsifê Berfiratî, Seîdê Wanî, Şerîfê Mûşî, Seydayê Binxetî, Arifê Bedlîsî û Mele Mihemedê Deşta Gewra çîrokên weha hebûn. Em ji van hemî hevalan re sipas dikin ku wan ji bo alîkariya vî karî, xwe ne dan paş. Em sipasiyeke taybetî jî li Hesênê Metê dikin ku ji van

kurteçîrokan, babetekî herî xweş hîlbijart û wekî edebiyateke niviskî ew di forma pirtûkekê de hûnand.

Bi çapa vê pirtûkê, ku me ciyê valayîyeke piçûk jî di pir-tûkxana kurdî de dagirti be, ji bo me bextiyariyeke mezin e.

Weşanên Welat

8

NEXWEŞÎ

Ev serê çar heftan e ku jinik bi nexweşîyeke bênav ketiye û anuha di nava nivînan de ye. Di çend rojên pêşîn de mêrik nizane ku nexweşîya jina wî ê ewqas dirêj bajo. An ne, wî ê di roja rojîn de jina xwe bibira ser doktorekî, li riya saxîya wê bi-geriya û anuha jî tew pêwîst ne dikir ku ewqas bîpa.

Mêrik hinekî bi dudilî ji oda gund derdikeve û ber bi malê tê. Dema ji deriyê eywanê dikeve hundur, nalîna jina wî ya nexweş dîsa tê bihîstin. Loma gavên wî sist dibin, lê dîsa jî dikeve hundur, ber bi nivînên jina xwe diçe, li ber serê wê rûdine, hêdîka destê xwe dide ser eniya wê, tiliyên xwe di nav porê wê î kej re dibe û tîne, û bi awayekî ku tiştêkî bixwaze:

- Tu çawa î, xatûn? dibêje.

Nalîna xatûnê berzîtir dibe û bi dengêkî nexweş dibêje: - Ji berê jî xirabtir im.

Dilpekiya hêviya xweşîyekê li mêrik sist dibe, bi dengêkî gazîndok dibêje:

- Ma ne bû ku dawîya vê nexweşîya te were! Xatûnên xelkê jî nexweş dikevin, lê min tew ne bihîstîye ku xatûneke nex-

9

weş ne hiştîye, an jî goti be na.

Jinik kujê lihêfê davêje ser serê xwe, destê xwe dide ser guhê xwe û di binê lihêfê de bi nalîn dike pile pil:

- Hewar ji destê te! Ma tu bi xwe jî carî nexweş ne ketiye!

Ma tu nizanî bê nexweşî çî ye?.

Mêrikê ku hêviya wî ji hiştina jina wî dikeve, vê carê hinekî jî bi hêrs dibêje:

- Nexweş, nexweş, nexweş!.. Tiştê ku ez dizanim, her ku biçe nexweşî jî ber bi başiyê diçe. Lê ez dinêrim ku tu her dibêjî: «Ji berê jî xirabtir im.»

Jinika nexweş di binê lihêfê de bi hêrs dinale û dibê:

- Belê, ez xirabtir im!.. ji do jî ... ji pêr jî xirabtir im! Wusa dixuye tu ê nexweşiyê li min girantir bikî.

- Baş e, nexweşiya te çi ye?

- Ez ê çawa bizani bim nexweşiya min çi ye? Ma ez doktor im?

Mêrik vê carê bi dengê nizm û hinekî jî bi bergerîn:

- Baş e, canekem, baş e ... ez dizanim tu hinekî nerihet î.

Lê ma kevir ê bibare ku tu piçekî xwe biqelibînî ser kêlekê? dibêje, bi kuj ekî lihêfê digirê û dike ku xwe di ber jinikê re dirêj bike. Lê nalîneke dilşewat bi jinikê dikeve, mîna ku xwe ji çavsoriya bêbextekî biparêze, lihêfê li xwe dipêçe û dibê:

- Nabe! Ez dimirim! Ax, ji destê vî mêrikî, Xwedêyo! Diçe derve, tê hundur ... nahêle ez çavên xwe bidim hev!.. Ez nexweş im ...

Mêrik kujê lihêfê ji dest xwe berdide, ji nivînên jinika nexweş dûrdikeve û di ber xwe de dike pilepil:

- Ya baştir ew e ku ez jî nexweş bikevim û xwe di ber te re dirêj bikim. Ez bi kuderê de biçim?. Biçim kuçê û çavên xwe berdim delinga kê? Tu bi xwe jî dizanî ku ev rehên pişta min, li min bûne wek çu. Wusa dixuye ez ê biçim bajêr ... biçim kerxanê.

Jinik di binê lihêfê de van gotinên mêrik dibihîse. Loma dema mêrik çêlî çûyîna xwe û bajêr dike, jinik jî bi kêfxweşî dibêje:

- Biçe!.. Te kuderê divê, here! Here ku ez jî di nava nivî-

10

nan de bi destûra Xwedê bimirim!

Bi bihîstina vî dengê re, mêrik li nivînan vedigere û dibê: - Ka hin pere bide min, ez biçim.

Mîna ku jinik bixwaze gavekî zûtir ji vî dengê bifilite, destê xwe î nexweş di binê balîva ber serê xwe re dike, kîsekî capûnî derdixe, hinek pere derdixe û dirêjî mîrê xwe dike. Piştî ku mêrik peran ji dest jina xwe digirê, zûzûka diçe ruyê xwe kur dike, kincên bajêr li xwe dike, hinek lewante jî di xwe dide, xatir ji jina xwe dixwaze û ji malê derdikeve.

Mêrik di riya rezên gund de ber bi riya bajêr diçe. Bêhna lewanta ku li xwe xistiye, bi bayekî hênik re li hawirdor belav dibe. Di vê navberê de çavên wî bi jinikekê dikeve. Hemêzek gîyayê ter li pişta jinikê û ji jor de tê. Gelek nabuhure mêrik jinika cîr ana xwe nas dike. Dema nêzîkiyê li hev dikin, cîrana wî ya xweşik û saxik bi pişirîn dibêje:

- Bi Xwedê, ji dûr ve jî bêhna lewanta te tê. Ji bo golikên me yên sawa, ez hatim qevdek gîya. Ka tu bi kuderê de diçî, te xwe çêkiriye û lewante di xwe daye ...

- Ez ê biçim bajêr.

Rûkeniya li ser ruyê cîrana saxik wenda dibe û dibê: - Çima, xêr e?. na xwe nexweşiya xatûnê lê aziriye?

Di wê gavê de kerba betaliya mêraniya çar heftan, heta ber qirika mêrik tê û devê wî dibêje: - Na. Ez ê biçim kerxanê.

Jinik têngêhîje û dipirse:

- Kerxane çi ye, cîran?

Li ser vê mereqdariya cîrana xwe, mêrik li wir li ser lîngan bi kurtî ji cîrana xwe re kat dike ku, wir: Avahiyeke mezin e, bi odên cuda cuda ne, di her odeyekê de xatûnek heye, mêrên heşaş diçine wir û pişta xwe nerm dikin. Dema ku mêrik çêlî van tiştan dike, cîrana wî ya saxik, carina bi matmayî li devê cîranê xwe dinêre û carina jî serê xwe dike ber xwe û dipişire, Piştî ku mêrik van gotinên xwe diqedîne, cîrana wî bi kenekî hûrik berê xwe bi hêla perçîna rezan de dike û dibê:

- Wîî ... pir ne maye ku cîranê min bixerife.

Mêrik jî bi kenê xwe beşdarî kenê cîrana xwe dibe û dibê:

11

- Rast e, pir ne maye ku ez bixerifim. Lê ku xatûna yekî nola min, heta çar heftan jî nehêle ez nêzîk biçim, wê çaxê ... ez ê jî bixerifim.

Piştî ku jinika cîran van gotinan ji devê mêrik dibihîse, pirsên xwe yên nîvçemayî jî ji cîranê xwe dipirse û dibê:

- Baş e, lê ew mêrên heşaş dûre çi dikin?

Mêrik herdu destên xwe di ber xwe de vedigirê, serê xwe dihezîne û dibê:

- Dûre jî... dûre jî meriv hinek pere didin wan, vedigerin û

tên mala xwe.

Jinika cîran dîsa bi rewşeke matmayî:

- Wî ... dibêje, ma hûn peran jî didine jinên wir.

- Erê lê. Meriv peran jî didin.

Jinika cîran li pêş mêrik difikire, diponije, dûre li ruyê Cîranê xwe dinêre û bi nîvşermokî dibê:

- Ku wusa be, ez jî dikarim ... ez dibêm ... tu wan peran li vir bide min ... ma çi pêwîst dike ku tu heta bajêr biçî ...

Mêrik di bin çavan re li cîrana xwe dinêre, ruyekî gulover, dev û pozekî lihevhatî, tilor û hingulên qelew dilê wî jî xirab dike û:

- Baş e, dibêje. Em ê wusa bikin. Ne pêwîst e ku ez biçime bajêr.

Piştî çarîkekî herdu cîran ji paş perçîna rezan derdikevin, her yek berê xwe bi aliyekî de dikin û ji hev diqetin.

Dema mêrik dikeve derê eywana mala xwe, nalîna nexwe-şiya jina wî hîn tê bihîstin. Li gel ku ev bi qasî saet û nîvekî bi tena serê xwe maye jî, ji ber agirê xwe xew ne ketiye çavên wê. Dilê mêrik bi jina wî dişewute, dîsa ber bi nivînê wê diçe, destê xwe dide ser eniya wê û dîsa tiliyên xwe di nav porê kej re dibe û tîne. Lê vê carê pê re nagêhîne ku rewşa wê bipirse. Lewra çer ku jinik bi çavên nexweş dibîne ku mêrik dîsa hat, mîna ku cinî bû be, qêrîn Û nalînek pê digirê û dibê:

- Hey li min ... bavo!.. Tu hêj li vir î! Tu hîn li dora min diçî û têtî ... ma tu nabînî ... nabînî ku ez di çi rewşê de me!..

Mêrik bi pişirîn Û dengekî nerm dibêje:

- Na na, xatûna min. Ez vê carê ji bo wî tiştî wusa nakim.

12

Ez dibêjim, ka bi rastî jî tu wusa pir nexweş bî, wê çaxê baştir e ku ez te bibim ser doktorekî.

Li gel vê nexweşiya xwe piştî ku jinik van gotinan ji devê mîrê xwe dibihîse, êşa nexweşiya xwe jî ji bîr dike, bi matmayîn li ruyê mîrê xwe î dilovan dinêre û dibê:

- Ma tu çi zû çû û hatî jî? ..

Mêrik bi rewşek xwînsarî:

- Ez ne çûm bajêr, dibêje û ji bilî tiştêkî piçûk ew hemû tiştên ku xwendevan pê dizane, ji jina xwe re kat dike. Piştî ku jinek hetanî dawiyê guhdariya mêrê xwe dike, vedigere ser û dibêje:

- De baş e, bi kêmanî ew perên me ji me re man. Ka wan peran bide min ez dîsa veşêrim,

U dema ku mêrik herdu destê xwe ber bi jor vedigirê û dibê:

- Min pere dan wê.

Bi van gotinên mêrik re mîna ku ew êşa jibîrbûyî dîsa li jinekê vegere û tew yekcar jî lê har bibe, bi nalîn dike pilepil û dibê:

- Tu çawa peran didî wê? .. Ew dêlika çawa peran ji te digirê! Ev xapandinek e ... tu hatiye xapandin. Ji kuderê ew xaxcirîna hînî girtina peran bûye! Ku çavên min bi wê bikeve, ez dizanim bê ez ê çi bînim serê wê! Çi zû hînî peran bû? Bi navê Xwedê, ez ê wusa bi porçika wê bigirê û wan peran ji çavên wê derxînim!..

Rûkenî li ruyê mêrik diyar dibe, dûre hûr hûr di ber xwe de dikene û dibê:

- H~!.. tew dengê xwe meke, tu ê me rezîl û riswa bikî, ha!..

Jinik kujê lihêfa li ser sîngê xwe bi hêrs hildavêje û bi wê hêrsê dibêje:

- Bila ew rezîl û riswa bibe! Çi zû bû bajarî! Bi Xwedê, ku ez ji nava van nivînan rabim, ez ê wê bikime xax!.. Dema ew nexweş diket, serê mehê dibû ... heta nuha ez bîst caran bi xêvo î mêrê wê ve raketim û min tew çêlî peran jî ne kiriye. Tew ne hatiye ser hişê min ... ne ketiye bîra min ku ez carekê

13

peran ji mêrê wê bixwazim. Ma ev çi rûreşî ye, gidî! ..

Ew rûkeniya ku gavekî berê li ruyê mêrik diyar bû bû, anuha hêdî hêdî wenda dibe, li dilopên xwîdana ser eniya jina xwe ya nexweş dinêre û wusa bêdeng dimîne. Lê jina wî jî her dike pilepil û çêlî wan peran dike.

14

PARSEK

Tûrê parsekekî li piyê wî ye û anuha kuçe bi kuçe di nava gund de digere. Ji ceh û genim heta nan û xwê, Xwedê çi dike para wî, ew jî digirê û davêje binê tûrê xwe. Di warê parsekiyê de bûye wek pisporekî. Ji rengên derî û penceran jî têderdixe ku xwediyên malan di çi rewşê de ne. Ji muxtarekî

bêtir bi kuçên gund dizane. Ji bilî vê zîrekiya xwe, di nasîna merivan de jî xwediyê zanebûneke zêde ye. Kî destvekirî ye, kî çikos e, bi nêhirînekê re têderdixe.

Kuça ku anuha tê de ye, kuçekê teng û dirêj e. Derî bi derî digere, geşta xwe berhev dike û ber bi jêra kuçê diçe. Ji rojan germerojeke havînê ye û parsek bi xwe jî westiyaye. Li pêş, xaniyekî sipî yê li ser du qatan heye. Parsek jî çavê xwe berdaye vî xaniyê sipî ku xwe bigêhîne wir û kasîkek dewê tirş û hênîk vexwe.

Piştî çend deriyên din, parsek tê û li ber deriyê hewşa vî xaniyê sipî disekine. Hinekî bêhna xwe digirê, dûre li derî dixîne û dikeve hundur. Bûkek bi bejnûballi jora heyatê rûniştiye û guliyên xwe dihûne. Parsek di devê derê hewşê de bi

15

du dangan banî bûkê dike û dibê:

- Xatûn, xatûn ... Xwedê zarokên malê ji xwediyên re bihêle! Ku te geşta min bida min ...

Bûk porê xwe î kej di nava tiliyên xwe yê xatûnê de dibe û tîne, bi rewşeke xweranegîn hinekî xwe ji cî dilivîne û dibê: - Ê ... de ka ... ez va li jor im. Ez nuha nikarim dakevim xwarê. Ku ez li xwarê bûyama ...

Parsek bi hustuxwarî ji hewşê derdikeve û hetanî serê kuçê parga xwe didomîne. Kuçe li wir diqede û jê wir û pê ve jî rê tune. Loma parsek jî di wê kuçê de bi şûn de vedigere. Çawa ku pez an jî dewarên qelew bala tacirên zana dikêşîne, xaniyên dewlemendan, xaniyên duqat û sipî jî wusa bala parsekan dikêşîne, Loma ev parsekê ha jî dîsa hatiye û li ber derê hewşa xaniyê duqat û sipî sekiniye. Di bin çavan re, di deriyê vekirî re li heyata xaniyê duqat dinêre ku xatûn li jor nîne. Wusa diyar e ku xatûn li jêr e. Dilê parsek xweş dibe û bi kêfxweşî dîsa li derî dixîne û dikeve hundur. Çer ku dikeve hundurê hewşê gwînê wî xweş û dilê wî şa dibe. Lewra sinik di dest xatûna wî de ye û hewşê dadimale. Parsek vê carê tiştêkî xweş û zêde dipê. Lewra wê bi xwe goti bû: «Ku ez li jêr bûyama ... » Û xatûn jî anuha li jêr e. Bi raman û hêviyên weha parsek dîsa bi du dangan banî xatûna xwe dike û bêyî ku bizani be xatûnê zarok hene an ne:

- Xatûn, xatûn

Xwedê zarokên te bihêle, dibêje. Ku te

geşta min bida min .

Mîna ku bûk vê daxwaza parsek di ser guhên xwe re bavêje, bêyî ku xwe rast bike û li parsek binêre:

- Welle ... de ka ... dibêje, ez va li jêr im. Ku ez li jor bûya-
ma ...

Ji ber vê liva bûkê, parsek bi parsekiya xwe şerm dike, serê xwe dixê ber xwe û hêviya wî ji xatûnê de dikeve. Lê beriya ku ji derê hewşa xaniyê duqat û sipî derkeve, li xatûna xwe vedigere û dibê:

- Na, bi serê min û xatûna min, tu ne li jêr û ne jî li jor ...

Lewra min tu li jêr jî û li jor jî dîtî.

16

AQILFIROŞ Û AQÎLKÎROX

Ev jî merivek e. Merivekî navsere ye. Lê tiştên ku wî heta vî salê xwe kirine, hemî jî bi awakî dudulî bûye. Duduliya wî eve. Ji xwe ne bawer e. Çi dike, di rastî û çewtiya wî tiştî de dikeve şikê. Aliyê wî yê şikebariyê lê zêde dibe. Ev jî jê re dibe asteng, çi çewt û çi jî rast. Pirî caran tiştên rast û baqilane jî dike, dûre şik lê radibe û bi hêrs xwe bi xwe dibêje: «Ax, ehmeq, ax! Ez ê ji vê kêmaqiliya xwe nefilitim, nal»

Di dawîya dawîn de biryara xwe dide ku bi çolan bikeve, ji xwe re hinek aqil berhev bike û pê baqil bibe. Li ser vê biryara xwe, ji mala xwe derdikeve.

Piştî çend roj û gelek rê, li ber devê çemekî rastî rîsipiyekî tê. Di pey germesilavek Xwedê re, herdu li hev rûdinin, cixare têne pêçandin û herdu serî dikevîne galegalên jiyanî. Dûre herdu jî têdigêhîjin ku ew yê li hember çi ye û çawa ye. Lê dema mêrik têdigêhîje ku rîsipî aqildarek e, mîna ku li xwe mikûr were, vedigere ser rîsipî û jê re dibêje:

- Bi Xwedê, ez jî kêmaqilek im. De ka tu ji kerema xwe re hinek aqil bide min.

17

Rîsipî bi rewşeke tacirî dibê:

- Ez aqil difiroş im. Ez bê pere nadim.

Mîna ku kêmaqil şerm bike, serê xwe dike ber xwe û di ber xwe de li heqîba kêleka aqilfiroş dinêre. Di ber xwe de bi dengê nizm dibêje:

- Ezbenî ma te tew bihîstiyê ku kesekî aqil
firotiye. Me-
riv aqil didin .

Rîsipî destê xwe dide ser heqîba xwe û dibe:

- Çima mewûj û tûyên hişk têne firotin, çima aqil neyête firotin? Mewûj zikekî vala tije dike û aqil jî seriyekî vala ... tu bi xwe jî dizanî, ne wusa ... Mîna ku mêrik bixwaze mistek mewûj an jî kodek tûyên hişk bikire, rasterast berê xwe dide heqîba rîsipî û bi mereqdarî dibê:

- Baş e, ez binêrim ka aqilên te tiştên çawa ne ... tu bi çi difiroşî ...

Rîsipî dipişire û dibê:

- Aqil di serê min de ye, ez bi gorî! Ma ji te wetrê ku aqil di heqîba min de ye? Xweş xuyaye ku tu û aqil, hûn gelekî ji hev dûr in. Binêre, min sê aqilên baş hene. Ez wan ne bi ceh û garis, û ne jî bi zêr û zîv didim. Ji bo ku ez wan bidime te, ji bo her aqilekî divê tu heft heyfan ji min re şivaniyê bikî. Ku te divê, fermo!

Mêrik dirame û diponije, heta salên xwe î çelî bê aqil an jî bi kêmaqilî jiyaye. Ew ê bikari be sê heft mehên din jî wusa bijî. Loma vedigere ser rîsipî û jê re dibê:

- Baş e, ezbenî. Ez dipejirînim.

Bi şertê ku rîsipî ê heta dawiya bîst û yek mehên din jî jê re çelî wan aqilan neke, herdu didine pey hev û derdikevin zozanê warê rîsipî.

Mêrik dest bi karê şivaniyê dike. Şev, roj û meh derbas dibin. Buharê pez dizê, havînê giya dibe PÛŞ û palax, siya dar û zinaran xweş dibe. Û dûre payîzxêr xwe dide paş, bi bayê xwe yê hênik re pelên dar û keleman diweşîne û notirê ji serma û pûka zivistana şevdirêj re dihêle. Bi vî awayî mêrik demên xweş û dijwar li xwe dibuhurîne. Lê carina jî difikire û xwe bi

18

xwe weha dibêje: «Bi Xwedê! .. ev rewşa min jî bêhişiya ser kêmaqiliya min re ye.» Lê pir ne maye. Pîr sê rojên din, roja peymanana wî û rîsipî ye. Di roja sisiyan de rîsipî banî mêrik dike û jê re dibê:

- Wek ku tu jî dizanî, îro bîst û yek mehên te qediyên.

Nuha tu baş guhdariya min bike, ez ji te re mafê te kat bikim. Dubare jî nakim ...

Gurpegurpa dilê mêrik e lêdide û bê tewatî li bendî gotinên rîsipî ye. Ew sê aqilên ku rîsipî ê bidana wî, jê re wek sê têr zêrê zer in. Tew anuha dema ku li ser van tiştan difikire, mereqdarî lê zêdetir dibe. Rîsipî jî serê xwe xistiye ber xwe, dest davêje tayên riyê xwe î sipî, eniyê li xwe diqermeçîne û dibêje:

- Aqilê yekemîn eve: Dema ku tu dibînî du kes bi hev ketine û şer dikin, divê tu têkilî wan nebî û wan ji hev nekî.

Mîna ku bibêje ma ev du gotinên ha jî aqil e, gurrpîna dilê mêrik sist dibe û kêfa guhên wî direve.

- Aqilê duyemîn eve: Ku tu bibînî jin û mêrê malbatekê . şer dikin an pevdîçinin, divê tu nekevî navbera wan.

Mêrik qudûmşikestî dibe û di dilê xwe de dibê: «Bi navê Xwedê, van bîst û yek mehên min jî tişteke havil ne kir,»

Rîsipî hêdî hêdî aqilê sêyemîn jî ji nav lêvên xwe dineqîne û dibê:

- Ê aqilê sêyemîn jî eve: Ku di civatan de kar ne karê te be, gotina ku bi te ne keti be, pîrsek ji te ne hati be pîrsîn; nebe nebe tu pozê xwe di nav re bikî, li ser tiştan bipeyivî û bersivên wan bidî!.. De anuha rabe ser xwe û biçe.

Piştî van şîretên rîsipî mîna ku kunek ava sar bi ser mêrik de hati be rijandin, sipûsar dibe. Dûre radibe xatir ji rîsipî dixwaze û di rêketinê de, rîsipî jê re dibê:

- Riya te vekirî be!.. Xwedê bi te re be! Ku rojekê ji hêla aqil de kêmasiyeke te bibe, tu dikarî dîsa li min bigerî.

Mêrik bi awakî bêhêvî û dilşikestî ji rîsipî vediqete, berê xwe dide mala xwe û diçe. Piştî rêçûyîna danekî, li kêleka riya gundekî dibîne ku du kes şer dikin. Wusa li hev didin ku hevdu bikujin. Loma dilê mêrik bi wan dişewute û dike ku biçe

19

xwe bavêje bextê wan, têkeve navîna wan û wan ji hev bike. Lê ji nişka ve aqilê ku rîsipî dabûyê, dikeve bîra wî. Ji bo ce-ribandîna aqilên rîsipî be jî, xwe bi şûn de vedikişîne taldeyekî û li wan temaşe dike. Di vê navberê

de du cendirme di rê de xuya dibin û ber bi gund diçin. Ew herdu kesên ku şer dikirin di cî de disekin. Ji wan yek zûzûka xwarî tiştêkî dibe û wî tiştî dibe li paş qûçeke nêzîk vedişêre.

Jendirme tèn taxa wan dinêrin ku serê herdu şergeran jî bi xwîn e. Loma herduyan didine ber xwe û dibin. Piştî ku jendirme û şerger ji wir dûrdikevin, mêrik ji ciyê xwe radibe, diçe li paş qûçê dinêre ku çî bibîne. Xençerek destîzîv û kwîzekî zêran e. Tavi lê têdigêhîje ku wan ji bo vî kwîzê zêran şer dikir. Mêrik radihêje kwîz û xençerê, zûzûka ji wir dûrdikeve. Di rê de baweriya xwe bi aqilên rîsipî tîne û xwe bi xwe dibêje: «Xwezika ez bîst sal berê wusa baqil bûyama!»

Bi êvarê re xwe digêhîne gundekî. Ji bo ku sibê rabe û riya mala xwe bidomîne, li deriyê malekê dide û wek mêvanekî X wedê. Li malê dibe mêvan. Piştî xwarin û vexwarina şîvê, herwekî ku em nizanin, mêrik bi xwe jî nizane ku ew tevlihevî çawa derket. Şîrpeşîrpa xwediyê malê ye, kurê xwe sîle dike û lê dide. Diya kurik bi dilekî tenik xwe davêje ser kurê xwe û naxwaze mêrê wê li kurê wê bixe. Xwediyê malê vê carê jî porçika jina xwe li destê xwe digêrîne û li erdê digevizîne. Mêrikê me î mêvan gelekî poşman dibe ku li vê malê bûye mêvan. Carekê hêz dide xwe ku rabe û ji xwediyê malê re bibêje: «Ji bona Xwedê, ji bo xatirê mêvanê xwe be jî, tu anuha wusa neke!» Lê tavi lê dikeve bîra wî ku rîsipî têkilnekirina tiştêkî weha jî goti bû. Piştî bidestxistina kwîzê zêran, her gotineke rîsipî jê re bûye wek riyek rast û ew jî naxwaze ji wê rê derkeve. Loma li hemberî vî şerê malbatê jî serê xwe dixwe ber xwe, xwe ker û kwîr dike, naxwaze tiştêkî bibihîse û bibîne.

Piştî şerê malbatê bêhna wan fere dibe û vê carê jî dixwazin mêvanê wan li wan bibore. Lê mêrikê mêvan hertim berê galegalê bi dereke din de dike û mîna ku wî tew hay ji wî şerî tune be. Di dawiya dawîn de xwediyê malê ji mêrikê mêvan re dibêje:

20

- Bi namûs, tu ji Xwedê re bûy ku te deng ne kir û tu ne ketî navbera me. An ne, min ê tu bidanay ber xençeran. Jina min pê dizane ... dizane ku dîsa rojekê weha em ...

Mêrik difikire û di dilê xwe de: «Bi navê Xwedê, her gotineke rîsipî fena nivişteke ye,» dibêje û sibetira rojê bi serfîrazî ji wir derdikeve û diçe.

Mêrik digêhîje mala xwe, bi rewşek dewlemend gelek wext derbas dibe, lê mêrik her li ser gotinên rîsipî dirame. Carina baweriyek mezin bi şîretên rîsipî tîne û carina jî dudulî pê digirê û xwe bi xwe dibêje: «Kwîzê zêran û pevçûna wê malbatê, rasthatinek bû,» Lê dîsa jî heta demeke dûrûdirêj newêre wî aqilê sêyemîn î ku rîsipî jê re goti bû, di ser guhê xwe re bavêje. Rojekê mîrê navçe banî hin kesên bi navûdeng dike ku bi wan re li hev rûnin û li ser rewşa navçeyên xwe bipeyivin.

Şeytan dikeve dilê mêrik û ew jî radibe diçe. Mîrê navçe ne şandiye pey wî. Lê ji ber dewlemendbûyîna xwe, ew jî hatiye û di nava melmezinan de cî girtiye. Herweha li oda mîr, ji her aliyên navçe malmezin civiyane û bi zimanekî malmezinan ketine galegalê.

Di vê navberê de destirmanê malê fêkî tîne, li ber civatê datîne û diçe. Dema mîr radihêje hinarekê ku bixwe, çavên xwe digerîne ku destirman kêr ji bîr kiriye. Mîr dike ku bi dengêkî, ji destirmanê xwe kêran bixwaze. Lê mêrik î lehengê me radibe, xençera xwe ya destîzîvîn ji ber piştta xwe dikêşe û bi tevgerek giramgîr dirêjî mîr dike. Çer ku mîr çav li xençerê dikeve, enî lê diqermeçe û çav lê dibin çal. Dema mêrik vê rewşa mîr dibîne, tavilê ew aqilê sêyemîn î rîsipî dikeve bîra wî, gwîn lê zer dibe û nizane bê çi bibêje. Xençer di dest de dirêjkirî dimîne û pî lê diqurime. Mîr zûzûka dadide xençerê û:

- Ev xençera bavê min î rihmetî ye. Dema hîn sax bû, jê hati bû dizîn, dibêje, banî balbasên xwe dike û mêrik davêje zîndanê.

Mêrik têngêhîje ku çi bi serê wî de hat.

Di zîndanê de gelek wext lê dibuhure, hertim dirame û di-

21

ponije. Dûre têdigêhîje ku ev xenîmbûyîna aqil e, lê nizane ku ew ê bi çi awayî bikari be ji zîndanê bifilite. Ji ~a ve tişteke dikeve bîra wî: Di rêketinê de rîsipî tişteke jê re goti bû: «Ku rojekê ji hêla aqil de kêmasiyeke te bibe, tu dikarî dîsa li min bigerî,»

Li ser vê yekê, mêrik radibe ji bo xelasiya xwe ji rîsipî re nameyeke dûrûdirêj dinivîsîne.

KÎJAN

Gilî, gilî ye. Çi ji rastiyê, çi ji firqûzî û çavnebariyê. Bi çi awayî dibe bila bibe, giliyê xelkê gundekî bi axê de tê kirin. Axa jî ne axayekî wusa zana û dilovan e. Loma ew jî radibe di dest de fermanekê radike ku ew gunda tev jin û zarokan bête şewutandin, Karûbarên ji bo şewutandina gund tête kirin û êdî dikin ku biçin û dest pê bikin.

Di vê navberê de çend mezin û rîsipyên vî navçeyî jî bi vê bûyerê dihesin. Dilê wan bi vî gundê bextreş dişewute, peyva xwe yek dikin û berê xwe didine mala axayê vî navçeyî. Her yek xwe bi xwîna mêrekî davêjin bextê axayê bêbext ku wî ji biryara şewutandina gund bikin. Ji axayê navçe re dibêjin:

- Axayê me, tu mezin û zana î, Tu gundên xwe û xelkên xwe ji me baştir nas dikî. Tu dizanî ku xelkê wî gundî bi ehmeq iya xwe navûdeng daye. Ku tiştê nerind goti bin jî, divê tu wê nerindiya wan bidî xatirê ehmeqiya wan û li wan biborî.

Herweha her rîsipyek tiştê dibêje û axayê serhişk ji ser riya şewutandina gund diçerixînin. Lê piştî galegalên wan,

23

axa gelekî difikire û dûre li wan vedigerîne û dibêje:

- Baş e. Lê ez ê anuha wan biceribînim. Ku bi rastî jî ehmeq bin, ez ê wan bibexşînim. Lê ku ehmeqiya wan tune be, wê çaxê ez ê tev jin û zarokên wan, gund bidime şewutandinê.

Hemî mezin û rîsipyên li dora axê kezeba xwe bi xelkê gund dişewutînin û di dilê xwe de: «Xwedêyo!.. tu li ruyê wan binêrî.» dibêjin û bi qirqilîn li bende ceribandina axê disekin.

Axa fermanekê dide balbasên xwe û wan gundiyan hemiyan tîne hewşa qesra xwe. Tev şêx û seydayên navçe, gelek mezin û rîsipî jî hatine temaşa vê dadgehê. Axa wan hemiyan li rasta hewşa xwe ya mezin dide rûnişkandin. Selikek fere tije mewûjên reş dike û dişîne di nava wan de dide danîn. Dûre tûrekî tije gagol jî dişîne û di ser selika mewûjên reş de dide rijandin. Paşîngî gundiyan li hewşê difermoyîne xwarina mewûjan.

Lê dema ku tûrê gagolan di ser mewûjan de tete rijandin, gagol xwe ji keviya selikê de berdidin xwarê û ji selikê dûrdikevin. Wê çaxê jî ji gundiyên vî gundî, yekî rîsipî li gundiyên xwe dike qêrînî Û dibê:

- Gundîno! Mewûjên ganî bernedin bila nerevin. Berê wan bixwin! Mewûjên mirî ji xwe nikarin bi deverê de birevin.

Li ser vê gotina rîsipî, hemî gundî xwe davêjin ser gagolên dora selika mewûjan Û davêjin devê xwe.

Li hemberî vê liv û tevgera gundiyên li hewşê, hemî şêx û mezinên li dora axê bi mitûmatî çavên wan fere dibin û li hev dinêrin. Bêhna axayê kambax fere û serê wî baş zelal dibe ku bi rastî jî tevayiyê vî gundî ehmeq in. Loma dûre li mezinên dora xwe dinêre Û dibê:

- Baş e. Ez van ehmeqên ha dibexşînim,

Dûre di navberê de gelek sal û wext dibuhure û diçe, axayê kambax jî dimire, lê ev navê ehmeqiyê ji ser vî gundî ranabe. Hîna îro jî dema ku çêlî mijara ehmeq iyê dibe, navê vî gundê ha tê ser dev û lêvan. Lê îro, gundiyên vî gundî jî

24

weha dibêjin:

- Rast e. Bav û kalikên me wek mewûjan gagol jî xwarin.

Xwarin ... lê ev ji baqiliya wan bû, ne ku ji kêmaqiliya wan bû ... Lewra ku wan wusa nekira, ew ê tev jin û zarokên xwe bihatana şewutandin.

25

EHMEQTbdNtEHMEQAN

Pirî caran lawik di piçûktiya xwe de li ber bavê xwe disekinî û jê dipirsî: «Bavo, merivên ehmeq çawa ne? Çima meriv ji hinek kesan re dibêjin, ehmeq» Bavê wî jî hertim weha bersiv didayê û digot: «Kurê min, tu serê xwe anuha di ber ehmeqan de nehêşîne. Kengî ku tu mezin bûy, tu ê bi xwe têbigêhîjî.»

Wext dibuhure, kurik mezin dibe û xortekî şepal jê derdikeve, dizewuce û tew dibe xwediyê sê serî zarok jî. Bav jî pîr dibe û dikeve nava nivînan. Anuha di nava nivînan de mirina xwe dipê. Lê beriya ku bav çavên xwe bide hev û ji vê dinê koç bike, banî kurê xwe dike û jê re dibê:

- Kurê min, ez êdî pîr bûme û li ber mirinê me. Wek bavekî, min tu xwedî kirî, min tu zewucandî û şikir ji Xwedê re te zarok jî hene. Ji vir weha berpirsiyarê mal û zarokên xwe, tu ê bikî. Ez dixwazim bibêjim ku ji bo te çi ji destê min hat, min kir û min da te.

Di vê navberê de pişirînên li dora devê her kalekî, li ser lêvên vî bavî jî diçin û tên. Mîna ku ramanên wîji wî dûr çûbe

26

çavên wî li dîwarê hember aliqîye. Dûre berê xwe dide kurê xwe û didomîne:

- Di piçûktiya xwe de, te pirî caran ji min dipirsî û digot: «Çima meriv, merivan bi navê ehmeqan dinavîne. Ehmeq çi yel» Min jî hertim di ser guhên xwe re davêt û min bersiva te ne dida ... »

Lawik zûzûka gotina bavê xwe î li ber mirinê dibire û dibê:

- Ji bona Xwedê, bavo! Dev ji van tiştan berde û li rihetiya xwe binêre. De qeyê wê çaxê ji ehmeqiya min bû, min ji te dipirsî ...

Pîremêrê di nav nivînan de, dinale û dibê:

- Na kurê min, na! Ne ji ehmeqiya te bû! Lê bêjeya ehmeqiyê êdî wusa bûye ku, bûye wek çilkek qirêj û herkes xwe jê dûrdixîne. Gotin an jî kirinek te ne li gor serê ehmeqekî be, ew ê bêjeya xwe ya ehmeqiyê bi te ve bizeliqîne. Ji ber vê yekê jî divê meriv lê bigere û bibîne ka bi rastî jî peyva ehmeqiyê baştirîn li kê tê. Ev wesiyetnama min e û ez ji te re dibêjim.

Pîremêrê kîsekî ji postê simorekê tijî zêr, ji binê balîva bin serê xwe derdixe, davêje ber lawê xwe û dibê:

- Piştî mirina min, divê tu li gund û bajaran bigerî. Ku te ehmeqtirînekî ehmeqan dît, tu ê vî kîsî bidî wî.

Di ser mirina bavê lêwik re gelek wext dibuhure, lawik radibe dikeve rê, gund bi gund, bajar bi bajar û herwekî ku tê gotin, lawik welat bi welat jî digere. Digere lê, ew yekê ku bavê wî yê rihmetî jê re nimandi bû, nabîne. Lewra karger û karmendên li bajaran riya jiyana xwe dizanin, renjber û gundî bi awakî hunermendî li ser karûbarên xwe ne. Dilê lêwik çargopal lêdide ku ew ê nikari be wesiyetnama bavê xwe bi cî bîne. Piştî dem û gerek dirêj, ramanek nû di serê lêwik de vedije ku bi serê çiyana bikeve û

biçe ba şivan û gavanan. Lewra wan ji bilî deşt û çyan, pez û dewaran, tiştêkî din an jî dereke din ne dîtine. Kesekî ku ew bivê, dikare li deverên wusa hebe.

Lawik van ramanên di serê xwe de jî bi cî tîne. Gelî û xo-

27

pan namîne ku di ser re gav dike, di çiya û zozanan de berwar dibe û diçe, rastî birek şivan û gavanan tê, bi wan re dîrûdirêj dipeyive. Lê mixabin, hemî kesên ku ew li van derina jî rastî wan tê, di warê xwe de û li gor xwe xwediyê zanebûneke baş in. Herweha hêviya lêwik ji dîyina yekî ehmeqtirîn dikeve.

Mêrik li ser kaniyeke devê riyekê rûdine, gelekî dirame û dûre xwe bi xwe dibêje: «Divê ez êdî bipirsim ka li kuderê dîn û ehmeq hene,»

Dibêjin ku Xwedê rast bîne, tîne. Gelek nabuhure siwarekî rîsipî xwe digêhîne kaniyê. Di pey silavek kurt re, li rewşa hev dipirsin, dûre lawik çîroka xwe ji rîsipî re vedike û jê dipirse ka li kuderê kesên dîn û ehmeq hene.

Çi bi tinaz û çi bi rastî, mêrik navê gundekî bi lêv dike û dibê:

- Yekî ku te divê, dikare li wî gundî peyda bibe.

Li ser vê yekê lawik dide ser rîya wî gundî û bi dilekî xweş diçe. Lê dema ku nêzîkiyê li gund dike, ev dilê wî yê xweş lê reş dibe. Lewra ew gundiyên ku ji gund derdikevin û diçin karê xwe, tew jî rengên ehmeqiyê bi wan nakeve. Li paş malên gund, li ser sergoyekî bilind, pêrgî dînekî tê. Ew yê dîn pêxwas û bi kincên pertolî ye. Li ser sergoyê bilind serê xwe rakiriye, devê xwe vekiriye û li xelkê dide dijûnan:

- Ez di dê û jinên we!.. dibêje û baş û nebaşa tevlihev dike.

Mîna ku dilê lawik ji van dijûnên dîn xweş bû be, bi pişirîn ber bi wî diçe û ji bo ku ehmeqiya wî jî bipîve, jê re weha dibêje:

- Gelo, tu çima nabêjî: Hûn di dê û jina min ... tu dibêjî ez!..

Dema ku dîn van peyvên ha dibîhise, dibe xwê û dikeve êr. Kevir û hîm namîne ku davêje lêwik û heta derveyî gund jî dide pey lawik. Li derveyî gund, li ber newalekê lawik dest û ruyê xwe dişo û dûre dikeve ramanên kwîr. Lê tiştêkî ji hev dernaxîne û ji wesiyeta bavê xwe re riyêke din

nabîne. Loma radibe ser xwe, di dilê xwe de: «Li min bibore, bavo!..
bibore

28

ku ez nikarim wesiyeta te bi cî bînim» dibêje û dikeve riya mala xwe.

Li derekê lawik xwe digêhîne gundekî şên, Weha carê bala xwe didiyê ku çî bibîne! Li hêleke axpîna gund mîna ku şerekî mezin daketi be, dengê qêrîn û hewarê bilind dibe; li hêla din jî govend û dîlanek li hev geriyaye. Lawik li hemberî vê bergehê mitûmat dimîne.

Gundiyan merivek li kerekî kwîr, pişturmî, bêkurtan, eşikxwar û kulek siwar kirine. Rewşa vî siwarê kerê, ji yê kerê ne çêtir e. Gundiyan ku li dorê ne, betal nasekinin. Kevir û kuç, rêx û tepik; çî bi dest wan dikeve, bi vî xirabsiwarê kerê pişturmî ve didin û jê re dijûnan dikin.

Lê hêla din jî gundiyan merivek li kerekî misirî kirine, tev kurtanê ku li ser piştta kerê, her aliyê kerê bi ben û temeziyên rengareng xemilandine û hefsarê kerê jî dane dest bûkeke xweşik, Rîsipî û mezinên gund jî dane pey û bi rewşek giramgîr li axpîna gund digêrînin.

Li hemberî vê bergeha seyr, lawik dikeve ramanên kwîr û dixwaze têbigêhîje. «Gelo ev hemî ji bo çî ne? Gunehkariya vî rebenê li ser piştta kerê reben çî ye? Aya çêyî û başiyên vî siwarê kerê misirî çî ye? .. » Lê lawik dîsa tiştêkî ji hev dernaxîne. Loma bi mereqdarî xwe digêhîne ber rîsipyekî û jê dipirse:

- Ev çî ye? ... çî qewumiye, xalo? Xalê rîsipî bersivê dide û dibê:

- Ew merivê ku li ser piştta kerê kulek û pişturmî, muxtarê me yê sala par e. Ê ew merivê ku gundiyan siwarî kerê xemilandî kiriye jî, muxtarê me yê îsalîn e.

Lawik dirame lê tînegêhîje ku çima. Pirseke din li pîrsa xwe ya pêşîn zêde dike û dibê:

- Baş e, lê tawanbarî û gunehkariya muxtarê sala par çî ye ku gundî lê hatine xezebê? Ma gundê we derxistiye firotanê, namûsa gund daye ber lingan?.

Xalê rîsipî dibersivîne û dibê:

- Na bi Xwedê, ciwamêro ne gund derxistiye firotanê û ne jî namûsa gund daye ber lingan. Lê tenê wexta muxtariya wî

29

qediyaye Û hew.

Mîna ku lawik bi ser tişteki ve bû be û:

- Ma muxtariya kê biqede, hûn wusa li wan dikin? dibêje.

- Belê.

Rûkenî û dilxweşî li lawik diyar dibe, bi lez dibeze pêş muxtarê sala nû, bi giramgîrî dadide hefsarê kerê wî yê xemi-landî û jê dipirse:

- Ku ez ne çewt bim, tu muxtarê sala nû ye, ezbenî.

- Erê.

- Muxtariya te bi xêr be û ez te pîroz dikim. Lê ... ma tu dizanî ku piştî du salan, wek wî muxtarê kevn, gundî ê li te jî bêne xezebê?

- Erê.

Ji bo ku muxtarê sala nû baş têbigêhîje ku ew dixwaze jê re çî bibêje, vê carê lawik pirsar xwe bi awakî vekirîtir dipirse: - Nuha bê henek. .. Tu baş dizanî ku piştî du salan, ew ê kevir, kuçik, rêx û gû li vê xemilandinê bibare. Ji dêla vê giramgîriyê ve xelk ê ji te re dijûn û gotinên nebaş bikin? Bersiva muxtarê bextiyar dîsa kin û kurt dibe: - Erê.

Li ser vê yekî dilê lêwik xweş dibe, bi pişirîneke giramgîr kîsê ji postê simorekê ji paşila xwe derdixe, dirêjî muxtarê sala nû dike û jê re dibêje:

- Fermo, bila ev kîsikê zêran ji te re be, ezbenî. Ez wesiyeta bavê xwe î rihmetî bi cî tînim.

30

PAŞA DÎN BÛ AN XELK

Di heyamekî de li navçeyekî, bajarekî mezin, şên û gelekî xweşik heye. Bajar di binê desthilatiya paşayekî dewlemend û sergez de ye. Ji xelkên xwe, birçiyar têr dike û taziyan bi kinc dike. Herweha paşa ji xelkê xwe û xelk jî ji paşayê xwe XWeş

e.

Dîwana paşê hertim ji xelkê tijî ye. Ji bilî viya jî salê du caran, hemî malmezinên navçe banî dîwana xwe dike, di civînên weha de bi remildarê xwe remlê dide havêtin û bi vî awayî xelkê navçe xwe ji xêr an jî xezeba pêş agahdar dike.

Ji salan dîsa salek wusa ye. Şêx, mele, mîr û mezinên vî navçeyî hatine û li dîwana paşê civiyane ser hev. Li ser hemî rewşên navçe tê peyivîn. Dûre paşa remildarê xwe dide bankirin. Remildar tê, bi rewşek giramgîr silavekê li paşê û li civata dorê hildide û diçe li ciyê kerametê rûdine. Piştî ku paşa gotinên xwe yên bi civatê re diqedîne, vedigere ser remildar û dibêje:

- De vê carê jî doba te ye, ya remildarê hêja! Ka binêre bê çi li pêşiya me ye. Ne kêm û ne jî zêde, te çi dît wê ji me re bi

31

lêv bike.

Remildar çarşefek reş û hinek av dixwaze. Xulam zûzûka diçin û tînin. Remildar avê dikişîne ber xwe, kefa destê xwe şil dike û di ser çavên xwe re dide. Dûre wê çarşefa reş di ser serê xwe de diqelibîne û di bin de xwe di ser avê de xwar dike. Dengê herî piçûk jî ji vî civata mezin nayêt. Bi çavên mereqdarî hemû li remildar û çarşefa reş dinêrin. Gelek nabuhure, remildar bi hêrs çarşefê ji ser xwe hildavêje û ji kwîr de axînekê dikêşîne, Li ser vê yekê paşa berê xwe dide remildar û dibê:

- De ka were zimên, ya remildarê delal! Ev keser û kovana te yaji kwîr, xêr e an şer e?

Remildar herdu destê xwe bêhêvî ber bi jor vedigirê û dibê:

- Ma çi xêr e, paşayê min! Li gor tiştê ku min di remla xwe de dît, boblateke mezin li pêş navçeyê me ye. Di dawiya payiza paşîn de ba û bahozek ê dest pê bike û ew ê heta sê şev û sê rojan bidome. Dûre jî bi şev û rojekê ew ê baranek xurt bibare. Lê ya herî xirab eve, çi kesê ku ji vê ava baranê vexwe, ew ê dîn bibe.

Dema remildar gotinên xwe diqedîne, hemî kesên li dîwanê bi rewşeke matmayî li paşê dinêrin. Li bendî paşê ne ku riya xelasiyekê ji wan re bibêje. Lê paşa bi xwe jî hustuyê xwe xwar kiriye û her li ber xwe dinêre. Dûre serê xwe radike, li civata dora xwe dinêre û bi awakî bêhêvî dibêje:

- Gelî civata delal! We hemiyar jî guhdariya remildar kir.

Tiştê ku ez bikari bim, an jî bibêjim eve: Hemî rûniştvanên navçe ji vê bob latê haydar bikin û bila ji nuha de sarînc, cîrn û bermîlên xwe tije av bikin.

Tevayiyê civatê van gotinên paşê dipejirînin û «Ya çêtirîn jî ev e,» dibêjin. Lê dûre baş xuya dike ku pejirandina vê pêşniyarê, tenê ji bo xatirê paşayê mezin e. Lewra piştî ku ev bûyera boblat di nava xelkê navçe de belav dibe jî, ji bilî paşa û wezîrê wî tu kesek sarîncan nade çêkirin û tije av nakin. Kes guhê xwe nade remildar, herkes pê tinazên xwe dike û di nav xwe de dibêjin:

32

- Ev dîsa virekiyek remildar e. Par jî goti bû: «Li buhara pêşîn bi qasî girbûna beqan ew ê zîpîkek bibare. Ji malên xwe dernekevin!» Û bi van virên xwe, em sê rojan di binê maxên xaniyan de tî û birçî hiştin, Dev ji wî beradayî berdîn!

Destpêka havînê dibuhure û hêdî hêdî ber bi payizê diçe.

Payîz tê û êdî dike derbas jî be, anuha di rojên xwe yên dawîn deye.

Li deştekan dûtî navçe, babelîskek radibe û wek rêsiyê palaxek hişk ber bi asimanan bilind dibe. Rûniştvanên navçe dibînin. Dibînin ku ew babelîska mezin dibe, dibe talazek xurt, berê ronahiya royê digirê û wek ewrekî reş ber bi navçe tê. Tirs û xofek mezin li xelkên navçe radibe û xwe davêjin hundurê xaniyên xwe. Sê roj û sê şevan ji binê sitara xaniyên xwe dernakevin. Piştî sê roj û sê şevan, ew boblata ba û bahozê ditefe. Lê di pey re jî mîna ku ji devê kun de birije, baraneke xurt dibare. Pir namîne ku bajar li ber avê biçe. Rewşek wusa xirab e ku dê xwedîtiyê li zarokên xwe nakin. Herkes ketiye taya serê xwe.

Lê piştî rojêke din tava baranê disekîne, wek hemû rojên payizên paşîn dîsa germ û ron e. Lê ev bûne çar rojên xelkê navçe ku ji hundurê mala xwe dernektine. Ji rûniştvanan gelekî wan pir namîne ku ji tîna bifetisin. Bêyî ku zêde li ser biramin, tavilê dadidin satilên xwe û dikişin ber kanî û bîran. Ji her kanî û bîrekê av tê vexwarin, pez û dewar tene avdan. Lê tenê paşa, wezîrê xwe û zarokên wan ji malê dernakevin û ji ava derve venaxwin.

Roja pêşîn bêdeng derbas dibe. Ava baranê di roja duduyan de rengê xwe li xelkên navçe dide der. Dengê tevlihev ji her kuçekê bajêr bilind dibe. Paşa û wezîrê xwe di malê de guhdariya vî dengê tevlihev dikin, gelekî diramin lê tiştêkî ji hev dernaxînin. Mîna ku neyaran havêti bin ser bajêr,

an jî serhildanek li dar keti be. Lê dema ku paşa û wezîrê xwe derdikevin derve û dinêrin ku çi bibînin. Ji zarokan heta kal û pîrên bajêr xwe şilfûtazî kirine, dibezin, lotikan didin xwe, jin û mêr li ber çavên hev bi hevdu ve dizeliqin. Paşa û wezîrê xwe li talda qoziyeke kuçê, xwe vedizilînin û ji wir te-

33

maşa bergeha xelkê xwe dikin.

Di vê navberê de xortek, paşê û wezîr dibîne. Bi dizîka heta ber paşê diçe, ji paş ve xwe davêje ser P8şê, taca serê wî ji serê wî dike û direvîne. Heta demekê jî paşa û wezîr li pey xort direvin ku tacê ji nav lepên xort derxin, Lê xortê çalak xwe nade dest wan û her di kuçan de dibeze. Xelkên di kuçan de dengê xwe bilind dikin û bi vê rewşê dikenin. Paşa û wezîrê ku dibînin weha nabe, dev ji tacê berdidin û vedigerin malê.

Paşa û wezîrê xwe heta çend rojan jî ji mala xwe dernakevin. Gelekî diramin, diponijin û bi hev dişêwirin, lê riyekî ji hev dernaxînin. Di dawiya dawîn de biryara xwe didin ku ji wî navçeyî bar bikin. Lê dûre bi vê biryara xwe jî nakin. Lewra paşa gelekî ji vî xelkê xwe hez dike û destê wî ji navçeyê wî nabe. Loma paşa dîsa bi wezîrê xwe dişêwire û weha dibêje: - Ya wezîrê min î delal! Herwekî ku tu jî dibînî, tevayiya xelkên bajêr dîn bûne. Bi vê rewşa xwe, em ê nikari bin bi wan re bijîn. Ez bi xwe du riyên derketinê dibînim: Barkirina ji vî bajarî, an jî vexwarina ji ava baranê ... Îcar ez dibêjim ... dibêjim ku vexwarina ava baranê, ji barkirinê çêtir e. Lê ez nizanim ... ka tu çi dibêjî.

Wezîr bi livek bêçare hustuyê xwe xwar dike û dibê: - Paşayê min î delal! Ma qeyê ez ji te ne çêtir im ...

Li ser vê yekê paşa, wezîr û zarokên xwe jî diçin ji wê ava baranê vedixwin.

34

SEYDA

Ji rojan rojeke îniya zivistanê ye, şilê û şepelî ye, sar û tarî ye. Seyda hîna nû ji mala Xwedê derketiye û di tariya kuçekê teng de, ber bi mala xwe diçe. Dema xwe digêhîne mal, dinêre ku jina wî li ber êrgûn rûniştiye û xwe diteriqîne. Piştî ku seyda li ber dêrî palto û potînên xwe ji xwe dike, dûre ew jî diçe li hêla din, li ber argûn rûdine. Heta demekê jî seyda û jina

xwe weha bédeng û bi çavên vala li çîk û kuzotên êgir dinêrin. Bédengê bi pirseke jinikê tê birîn û ji seyda re dibêje:

- Mijara waeza îşevîn çî bû, seyda?

Bêyî ku seyda çavên xwe ji kuzotên agirê di argûn de biçerixîne:

- Ewk bû, dibêje. Li ser xêrên rojên îniyan bû. Ji bo xê-
rênzêde .

Jina wî dîsa dipirse:

- Li gor ola me, çî tişt .. kirina çî tiştan xêrên wan zêde ne? Seyda berê xwe ji agirê êrgûn dizivirîne ser awurên jina

xwe, herdu destên xwe di ber xwe de ve digirê û dibê:

- Derxistina şîva miriyan ... bi hev re raketina jin û mêr ...

35

Ev hevoka dawîn bala jina seyda dikêşîne û carek din di-pirse:

- Çawa raketina mêr ûjin?

Seyda hinekî jî bi pişirîn li jina xwe ya xweşik û tilormezin dinêre û dibê:

- Ango, di şevên îniyan de, her cara ku jin û mêr bi hev re radikevin ... û ewk dikin, mîna ku gawurekî bikujin, ewqas xêr e.

Jinik zêde jî pirsina nake. Dîsa çavên xwe yên gir ber bi argûnê pêş xwe beloqî dike û dikeve ramanên kwîr. Gelek nabuhure radibe ser xwe û diçe oda raketinê, nivînên xwe datîne û dikeve nava wan. Piştî seyda jî radibe ser xwe, xwe ji hev derdixîne û diçe xwe di ber jina xwe re dirêj dike.

Heta çend deqên pêşîn, ode bédeng e. Piştî ku ji bo razanê dîsa lampe tê vêsandin, seyda dest bi gunehweşîniya xwe ya herşevîn dike û bi dengêkî nîvçe weha dike pilepil: «Tobe îstexfirellah, ya Rebbî, tobe! Çî gunehên me kirine, tu ef bikîl Emelê me salih, îmana me kamil bikîl! Hifza me ji însanên nerind, hukmata zalim û şeytanê ellenaletila bikîl Qeda û bela di ser mala me de daf bikîl, li wê dinê me ji îmanê nekî û cineta baqî bi para me.kîl» Bi peyva «Amîn!» jinik jî di tariya nav lihêfê de beşdarî seyda dibe û ode dîsa xwe kerûlal dike. Gelek nabuhure pistepista dengê jinikê tê û ji seyda re dibêje:

- Ma em gawurekî nekujin?

Seyda derpê û kirasê xwe ji xwe dişeqitîne û defa sîngê xwe bi gêwur de dike. Piştî pênc deqan gawurek tê kuştin û wek leşgerekî westyayî, seyda xwe li ser piştê davêje û dikeve xweşkewek xewek giran. Lê ev xewa giran li seyda gelek nabuhure, jina wî bi enîşka xwe dikute tengala wî û dîsa bi pistepist dibê:

- Ero, ma em gawurekî din jî nekujin?

Ew xewa giran li seyda diherime, mîna ku bibêje, «Serê te û gawuran bixwe!» piştî du sê bawîşkên bêdil, dîsa berê xwe bi jina xwe de dike û li ber gêwur pan dibe. Gawurê vê carê, hinekî dereng tê kuştin. Heta ev karê kuştinê diqede, defa

36

sîngê seyda di xwîdanê de dilewute û tev wê xwîdana xwe, lihêfê dikêşe ser xwe.

Lê xew nakeve çavê jinikê. Xwe li vê hêlê û wê hêlê diqe-pijîne, li ser zik û ser piştê diqelibîne, çavên xwe dide hev û bi hev de dişidîne, Lê wek birîndareke şerekî giran, ji ber êşa xwe xew nekeve çavan, jinik jî heta nîvê şevê nikare rakeve. Seydayê li teniştê jinikê, ji zû de ketiye xew û kî dizane bê anuha bi çi xewnên xweşik dijiya! Dîsa şeytanî bi jinikê digirê, destê xwe davêje milê seyda, du sê caran dihejîne û bi wê pistepista xwe ya êvarîn tiştina dibêje. Lê seyda wek berê bi carekê şiyar nabe. Piştî ku jinik çend carên din jî milên wî dihejîne, seyda bi serxewî şiyar dibe û dibê:

- Hii?. Çi ye, çi bû?

Jinik devê xwe ber bi ruyê seyda dike û hêdîka dibêje: - Ma em dîsa gawurekî nekujin?

Bêhna seyda teng dibe, mîna ku bibêje, «Ruyê min reş bû ku min ji te re got: Tişteki weha, xêreke mezin el» ditengije û mirûzê xwe tirş dike. Lê tariya odê nahêle ku jinik vî ruyê enirî û mirûzê tirş bibîne. Loma heta ku mêrik ji nava nivînan radibe, diçe ber kincên xwe û wan li xwe dikêşîne jî, jinik têngêhîje ku seyda çi dike an jî ew ê çi bike. Lê dema dibîne ku seyda ji wexta xwe dereng ket, bi dengêkî ziraftir banî wî dike û dibê:

- De were seyda! Ma ka tu çi dikî, q3şO min ji te re got, em gawurekî bikujin?

Seydayê ku heta ber qirikê tije bû bû, hinekî jî bi hêrs li jina xwe vedigerîne û dibê:

- Erê, erê! Ez jî diçim banî hemû ometa Mihemed dikim ku ew jî werin gawuran bikujin!

37

HOGîR

Çend naşî bi hev re bûne heval û di gund de diçin û tên.

Her cara ku weha bi hev re digerin, tirs dikeve dilê merivan. Di demên weha de bi hevaltiyeke germ û giramgîriyeke jidil in. Bejnûbalên hemiyan jî bilind û bi destûpê ne. Bi kurtî, ji bo hev hevalên rojên giran in. Loma tu rojekê kesekî ne diwêri bû ji wan re gotineke nebaş bikira.

Ji van neşîyan yek, ji hemî hevalên xwe dilsoztir û dilgermtir e. Rojekê bavê vî kurikê dilsoztir dixwaze bizani be ka lawê wî çiqasî hevalê xwe dinase, û loma jî dipirse:

- Kurê min, hevaltiya te û hevalên te çawa ye?

- Gelekî baş e, bavo.

- Hûn hemî jî ji hev re wusa ne, an? ..

- Belê, belê. Em hemî jî ji hev re wusa jidil in.

- Ku biqewume ...

- Ku biqewume, em dikarin serê xwe jî di ber hev de bidin.

Li ser vê yekê bav dixwaze hinek tiştan ber bi guhê kurê xwe bixîne ku hevaltiya bi herkesî re, ne hevaltiyeke jidil e:

38

- Lawê min, dibêje. Ez baş nizanim, lê divê meriv hemî hevalên xwe wek xwe, an jî wek hev nebîne. Ji hevalan yek dudu ... dikarin baş bin, jidil bin. Lê beroşa jîyanê wusa dide diyarkirin ku her heval nikare bibe hevalê roja giran ...

Mîna ku kurik ev gotina bavê xwe li dilê xwe girti be, li bavê xwe vedigerîne û dibê:

- Na, ne wusa ye, bavo. Bi rastî jî hevaltiya me hemûyan jî, hevaltiyeke rojên teng û tarî ye. Ji tu hevlekî xwe jî, ez guman nakim ku rojekê hevalê

xwe di tengasiyê de bihêle. Dibe ku te di wexta xwe de hevaltiyeke wusa ne kiri be, lê em nifşên îro wek berê nafikirin, bavo.

Û kurik vê hevaltiya xwe bi hevalên xwe ve her didomîne.

Ev hevaltiya wan li nav bîstanê xiyar û petêxan, li paş malên gund û di nava kuçan de dibuhure. Ev hevaltiya ku tê gotin an jî dibe, dilê bavê kurik tew jî lê nakele. Loma rojekê difikire çî bike ku nimûna hevaltiyeke baş pêşanî kurê xwe bike û pê hevaltiya hevalên kurê xwe bide naskirin.

Şevêkê, bavê kurik li ser sekûka eywana mala xwe rûniştîye. Çer ku dengê deriyê hewşê tê bihîstin, bav serê xwe dike ber xwe û her diponije. Heta ku kurik ji hewşê derbasî hundur dibe û tê li ber bavê xwe disekine jî, lê bav serê xwe ji ber xwe ranekê. Mîna ku di geliyê ramanê xwe de çû be xwarê û hay ji xwe tune be.

Kurik bi mitûmatî li bavê xwe vedigere û dibê:

- Bavo!.. tu çima ewqas bi raman î? Na xwe tiştêkî bêxêr . ?

qewulDlye ...

Bav di ber xwe de û bi dengêkî nîvçe dibêje: - Bêkesî tiştêkî xirab e, kurê min.

Lawik bi dilekî tenik li ber çogên bavê xwe rûdine û dibê: - Çi ye, bavo?

Bêkesî çi ye? Ma yekî ji te re gotinek nebaş

kiriye, çi ye? De ka tu ji min re bibêje, çî qewumiye?

Kurik xwe bêkes nabîne. Lê bêkesiya bavê wî, ya wî ye jî.

Loma dixwaze bi bavê xwe bide zanîn ku ew ne bêkes in. Lewra hevalên wî yên jidil hene. Bavê wî devê xwe ber bi guhê wî dike û bi dengêkî dizî jê re dibêje:

- Kurê min, bila ji devê te dernekeve ... Şeva berê ez di nav

39

bîst anê me î xiyar an de bûm. Min dît ku yek rasterast hat û kete nava bîstanê me. Ez têngêhiştim ku ew hatiye diziyê, an tiştêkî din. Min bi çend dangan jî banî kir ... lê ne deng û ne jî bersiv ... vê carê jî rasterast xwe li dengê min girt û bi ser min de hat. Min nêhirî ku ew ê li min bide, lê min berî wî dest rakir û min nalcix dawşand serê wî. Heta ku ez li xwe varqilîm û poşman bûm, mêrik miri bû jî. Gunehê wî li hustuyê wî be!.. Mêrik ne ji vî navçeyî jî bû. Min rabû kirasê xwe yê dirêj î sipî', li cendekê wî pêçand

û min ew li hêla jorîn, li kujê bîstên veşart. Îcar divê em biçin wî ji wir derxînin û bavêjin ciyekî dûr ku li ser me nemîne ...

Kurik di dest de peyva bavê xwe dibire û dibê:

- Tu tew xwe nerihet neke, bavo. Ew karê min e. Bavê wî dike rabe ser xwe û ji lawê xwe re dibe:

- Tu bi tena serê xwe nikarî. Divê ez jî bi te re werim.

Cendekê teresbavo giran e ...

Kurik dîsa peyva bavê xwe di devê wî de dihêle û dibê: - Na na, bavo ... ez ê banî hevalên xwe bikim.

Bavê kurik bi tirs û xofa mêrkuj ekî berê xwe dide kurê xwe û dibê:

- Kurê min, nebe nebe tu ji hemî hevalên xwe re bibêjî! Ji du hevalên xwe yê herî baş re bibêje, bes e.

- Na na, bavo. Hevalên min hemî jî baş û bawermend in.

Lê dîsa jî ez ê ji du hevalan re tenê bibêjim, lewra zêde jî pêwîst nake.

Herweha kurik bi tenê ji mal derdikeve. Şev reş û tarî ye.

Di kuçê de ber mala hevlekî xwe î malnêzîk diçe. Tiştê ku kurik li ser dirame ev e ku ew ê du hevalên xwe tenê ji vê bûyerê haydar bike. Lê dema ku li deriyê mala hevalê xwe dixwe, bûyerê pê dide zanîn û jê dixwaze ku bi hev re wî cendekî ji wir dîrxînin, bersiva hevalê wî bi awakî din dibe.

Lawik diçe li pencera mala hevlekî xwe î din dide. Piştî ku bûyerê jê re kat dike, jê alîkariyê dixwaze ku ew bi hev re biçin wî cendekî ji wir derxînin û bibin li ciyekî dûr binax bikin. Ev hevalê wî yê hertim rûken, bi carekê re gwîn lê vedimire, pêşmaleke xerîbiyê digire serçavên wî û ji lawik re dibê:

40

- Lê ... Xwedê neke ku yek bibîne!.. em ê ji bendîxanan dernekevin, bi Xwedê!..

Kurik li vir jî qudûmşikestî dibe û mîna ku hêdî hêdî ba-weriya xwe bi wan gotinên bavê xwe bîne, bi nîvhêvî di tariya şevê de diçe ser rocina mala hevlekî xwe î din û banî wî dike. Mîna ku ji hevalên xwe yê din re goti bû, kurik ji vî hevalê xwe re jî çîrokê kat dike. Lê dema ev hevalê wî jî xwîn

û kuştina yekî dibihîse, li wir poşmaniya hevaltiyê li zimanê wî dipiçike û dibê:

- Heval, bi Xwedê ez ê bihatama ... lê ev du roj in ku bi şev çavên min derekê nabînin. Ez bawer im ... ez şevreşkî bûme.

Herweha hêviya kurik ji hemî hevalên wî dişikê. Xwe bi xwe: «Ez ê li ser riya xwe ji vî hevalê xwe re jî bibêjim û bes e,» dibêje û diçe li deriyê mala wî hevalê xwe jî dixîne. Pêî ku hevalê wî derdikeve û wek hertimî li rewşa hevdu dipirsin, kurik radibe bûyera ku di serê bavê wî de hatiye, ji wî re jî bi ta û derziyê dixê.

Lê hevalê wî lê vedigerîne û dibê:

- Heval, bi navê Xwedê ku ne ev tiştê bûya ... wekî din çî dibûya bila bibûya, ez ê bi te re bihatama. Vî tiştî ne... lê tu wekî din çî ji min dixwazî bixwaze.

Kurik êdî ne tişteki dibêje û ne jî tişteki din dike. Di kuçên tarî de bêdeng tê malê. Di riya malê de mîna ku ji hev de keti be, ewqas bêhêvî, ewqas şermezar e ku, nizane ka ew ê bi çî ruyî li bavê xwe binêre an jî jê re bibêje çî.

Dema dengê deriyê hewşê tê, bavê wî radibe û di nava ni-vînan de rûdine. Bav dinêre ku lawê wî bi mirûzekî tirş û tal dikeve hundur. Loma di dilê xwe de kêfxweş dibe ku gotinên wî ê di serê kurê wî de bi cî bibin.

Lê dîsa jî bi tevgera mêrkujekî ji lawê xwe dipirse û dibê:

- We çî kir, kurê min? Hêvîdar im ku kesekî hûn ne diti bin.

Lawik bi rewşeke şermezar dibê:

- Na bavo ... ji hevalên min tu kesekî jî xwe neda ber vî tiştî.

Bavê kurik bi tevgerê mitûmmatî li kurê xwe vedigerîne

41

Û dibê:

- Çawa dibe kurê min?. ew hevaltiya ewqas germ û xweş ... ma tew ne kuştina yekî ye jî... tenê dûrxistina cendekê mirîye ...

Kurik bêdeng û bi şerm diponije. Dengê xwe nake. Mîna ku bibêje: «Erdo tu biqelişî û ez tê de biçime xwarê!» li pêş bavê xwe hûr û piçûk dibe.

Bavê wî têdigêhîje ku kurik ev yeka ha, ji hevalên xwe ne dipa. Loma bav bi rewşek bêçare ji lawê xwe re dibêje:

- Baş e, kurê min. De tu rabe hîn ku sibe ne bûye, zû xwe bigêhîne mala hevalekî min î kevn ...

Lawik bêhêvî serê xwe ji ber xwe radike û li bavê xwe dinêre. Ev gotinên bavê wî jê re mîna tinazeke giran tê. Lewra ewqas hevalên wî yên dilsoz xwe ne dabûn ber vî tiştê, ma ew ê kevnehevalekî bavê wî xwe bida ber vê xeteriyê. Lê dema bav gotinên xwe dicarîne, kurik radibe ser xwe û bavê wî didomîne:

- Biçe vê navnîşanê, silavên min lê bike û ev xezaba ku bi serê me de hatiye, jê re kat bike û bibêje ... bila ew bi te re were ...

Li ser vê yekê kurik di şeva nîvê wê şevê de dide ser riya mala hevalê bavê xwe û diçe. Navnîşan li gundekî din e. Piştî ku tê ber mala wê navnîşanê û li dêrî dixîne, dibîne ku derî vebû, li ber ronahiya lambeyeke piçûk ruyê merivekî salbuhurî û nenas xuya dibe. Erê, bavê wî di piçûktiya wî de jê re çêlî vî hevalê xwe kiriye, lê wî bi xwe ne dîtiye, an jî tew nayê bîra wî. Mêrikê serxew ji lêwik dipirse û dibê:

- Fermo, xorto? Tu kî î, di vê şeva nîvê şevê de te çi divê?

- Ez lawê filankeso me, bavê min gelek silav ji te re bi rê kirû ...

Dema ku qala navê filankeso dibe, gwînê mêrik tavilê ve-dimire, xwezî di ber de dimîne, lê dîsa jî xwe pê re digêhîne û peyvên kurik dibire:

- Li ser ser û çavên min! Lê ev çendik û çend salên min û bavê te ye ku em bi hev re deng nakin. Lê ... dev jê ber de, serê xwe bixwe! Tirsê dilê min ev e ku tiştek bi serê bavê te

42 /

de hati be. An ne bavê te, di vê şeva nîvê şevê de tu heta vir ne dişandî, Ca bibêje, na xwe bavê te pir nexweş e?

Kurik li wir li ser lingan bûyera ku bi serê wan de hatiye, bi kurtî ji mêrik re kat dike û weha dibêje:

- Bavê min ez şandim ku beriya berbanga sibê, divê ew cendeka ji wir bête derxistin û dûrxistin. Ê bavê min got, bila alîkariya xwe ji me re nede paş û ...

Mêrik taviî derbasî hêla hundur dibe, lawik jî bi tena serê xwe, bi rewşek gelek kêfxweş û gelek dilteng dipê. Gelek nabuhure mêrik hespê xwe ji tewlê dikişîne derve, cil dike, serûguhê xwe dipêçe, xençera xwe di ber pişta xwe de dike xwarê û beriya ku li hespê xwe siwar be, vedigere ser kurik û jê re dibêje:

- Baş e, xorto. Tu vegere, gelek silavên min jî li bavê xwe bike û jê re bibêje, bila tew hustuxwar nebe û tiştê ku ew dixwaze, ez ê bikim.

Kurik li vê hevaltîya kevn mitûmat dimîne û hertişt jê re wek xewnekê dixuye. Ne bi çavê xwe û ne jî bi hişê serê xwe bawer dike. Lawik hîn di nava ramanên weha de ye, hew dinêre ku hevalê bavê wî xwe havêtiye ser pişta hespê xwe û di tariya berbanga sibê de wenda jî bûye.

Mîna ku hîna nû hişê wî di ber tiştan de biçe, kurik bi ra-manên tevlihev vedigere malê.

Beriya ku ro xwe bavêje der, mêrikê nenas tê mala hevalê xwe î kevn, li rewşa hev dipirsin û pê dide zanîn ku wî cendek havêtiye kîjan şeqala çiyê. Piştî ku mêrik xatir ji wan dixwaze û diçe, bavê kurik banî wî dike û dixwaze bi hev re heta wê şeqala çiyê biçin.

Di rê de bav ji kurik re dûrûdirêj çêlî bûyerê dike. Kat dike ku wî çawa kavirek serjê kiriye, hûr û pizûrê wî derxis-

tiye, baş baqij kiriye, ji bo xwarinek tamdar hemî tiştên pêwîst li nava teştêk girar xistiye û dewusandiye hundurê laşê kavir, li ser terafa agirekî xurt pijirandiye, dûre bi naylonekê pêçaye, cawekî sipî jî di ser naylonê de li laş gerandiye û biriye di nava bîstanê xiyaran de çalek kolaye û ew laşê pijartî tê de veşartîye. Bav li van gotinên xwe zêde dike û dibê:

43

- Û anuha jî em ê biçin wî cendekî ji şeqala çiyê derbixin û bînin malê. P3şê jî tu ê biçî pey wî hevalê min î kevn ku em bi hev re 13şê kavirê pijirandî bixwin. Lewra ew jî hîn bi vê çîrokê nizane.

44

KÎ ÇI BIKE BI XWE DIKE

Mêrikekî xizan xwe di nava mêrgekî de dibîne. Şireşira avzêman e, zelal zelal diherikin. Gîyayên mêrgê bi qasî çar ti-liyan bilind bûye, bêhna kulîlkên rengoreng li hawirdor belav dibe û diçe. Mêrik hew carekê dibîne

ku lorek ji nava mêrgê derdikeve, berê xwe dide beyareke hişk û biring û diçe. Ji hêlekê ve tiqetiqa PÛş û palaxa beyara hişk e, bi lor dikene û ji hêlekê ve jî ew gîya û kulîlkên mêrgê di ber vê rewşa lor de hustuxwar dibin.

Lê tew jî xema lor nine. Ne devbeşiya PÛş û palaxa beyarê, û ne jî çilmisîna gîya û kulîlkên li mêrgê ... tişteke jî bala lor nakişîne, Ew her axê dikole û axa kolayî di ser serê xwe de dike. Piştî demeke kurt, ew axa kolayî li ser serê lor mezin dibe, dibe komrişk û lor di nav de wenda dibe. Mêrik ji nişka ve ji xew şiyar dibe, radibe ser xwe û çavên xwe mist dide, dûre herdu destên xwe ber bi jor vedigirê Û dibê:

- Karê te nexşîn e, Xwedê! Tu mezin î, Xwedê!

Dûre jî heta derengî şevê xew nakeve çavên mêrik Û her li

45

ser vê xewna xwe diponije û dirame. Lê xewa şevê ji wî pir dûr e. Radibe kasikek av vedixwe, dîsa diçe xwe di nava nivînên xwe de radimedîne û heta sibê ranabe.

Şeva din mêrik dîsa di xewna xwe de li ser zinarekî ye. Bi qasî çar werîsan ji mêrik dûr, şivanek li ser zinarekî wusa bilind rûniştîye ku, ku meriv jê bixuşikiya û biketa, heta geliyê binê zinêr tişteke bi meriv ve ne dima. Şivan jî tûrê nanê xwe bi gilîçekekî kelama li kêleka xwe ve darde kiriye û bi bayekî hênîk re pifî bilûra xwe dike.

Mêrik dibîne ku piştî gavekê, bizineke zîyanî ji nava col vediqete û tê li dorhêla şivên diçêre. Gelek nabuhure zîyanîtiya bizinê pê digirê, devê xwe davêje tûrê nanê şivên û dixwe. Bi nêhirînekê re şivan dibîne ku bizin di ser nanê wî de ye. Şivan bi hêrs şiva xwe radike û li quloçê bizinê dixwe. Bizina bêhay ji ciyê xwe diveciniqe, xwe nagirê û ji zinêr de gêrî xwarê dibe.

Bi ketina bizinê re mêrik jî ji xew diveciniqe ser xwe, mîna ku yekî kunek ava sar bi ser de rijandi be, di nava nivînên xwe de sipûsar dibe.

Ev herdu xewnên mêrik bandoreke mezin lê dike. Di nava nivînên xwe de heta demeke dirêj jî rûniştî diponije, difikire û ramanên cûr bi cûr di serê wî de vedijine. Lê dûre baweriyeye bê guman lê çêdibe û xwe bi xwe

dibêje: «Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike,» û ev dîtin jê re dibe wek felsefeyekê û di serê wî de bi ci dibe.

Sibê zû radibe berê xwe dide mala mîr, diçe li deriyê mala wî dixê, dikeve hundur û li hafa wî dibê:

- Siba te bi xêr, mîrê min. Xwedê bi te re be! Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike.

Piştî van gotinan, mîr jî radibe zêrekî dike destê mêrik û mêrik tê mala xwe. Sibetirê mêrik dîsa berê xwe dide hafa mîr û li ber mîr:

- Siba te bi xêr, mîrê min! Xwedê bi te re be! Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike, dibêje, bi van gotinên xwe mêrik dîsa dibe xwediyê zêrekî û vedigere mala xwe. Sibetirê û sibetirînê ... dîsa û dîsa ... herweha ev ji bo mêrikê xizan dibe kare-

46

kî rojane.

Piştî çendekî xizaniya mêrik hêdî hêdî wenda dibe û ciyê xwe ji riya dewlemendiyeke berbiçav re dihêle. Ev dewlemendiya wî êdî ji derûcîranên wî ve jî dixuye. Tiştên hundurê mala wî pir bûne, kincên li ser nû bûne û hewşa wî tije pez û dewar bûye. Ev hemî tiştên ha, rengên dewlemendiya wî ya nûne.

Rojekê ji cîranên wî yek diça mala wî, pêşiyê hinekî li hev dipirsin û dûre cîranê wî bi mereqdariyeke dilbijok jê dipirse û dibê:

- Cîranê delal! Tu jî dizanî ku dibêjin: «Pirsa cîran ji cîran dibe,» Ma tu li kuderê î, tu çi karî dila"? Ma meriv tew li cîranê xwe napirse?

Çi pirsên ku cîran ji mêrik dike, hemû jî têne bersivandin.

Pirsên ku cîran ji vir û pêve dike, bi mebesta fêrbûna dewle-mendiya mêrik e. Mêrik bi xwe jî vê kula dilê cîranê xwe dizane. Lê ji ber ku gelekî bi wê felsefa xwe bawer û ewle ye, xwe ji cîranê xwe venakişîne ku riya dewlemendbûyina xwe jê re bi lêv bike. Lewra «Kê çê bikira bi xwe û xirab jî bikira bi xwe dikir,»

Di dawîya dawîn de cîranê wî rasterast jê re dibêje:

- Tew karê te tune bû, te ne çit û ne jî weh bû, rez û erdên te jî tune bûn ... herwekî me, rewşa te jî giran bû ... Şikir ji Xwedê re! Lê ez dibêjim ... ev dewlemendî ji te re ji kuderê û bi kîjan rê ...

Mêrik hay jê hebû ku cîranê wî ketiye binçengê wî ku tiştina hîn bibe. Lê mêrik vê yekê ji bo xwe astengeke mezin nabîne. Ji ber vê yekê jî tew nahêle ku cîranê wî zêde xwe bêşîne, Radibe bi kurtî wê riya dewlemendiya xwe, ji cîranê xwe re dibêje. Piştî ku cîran guhdariya mêrik dike, bi gelek pirsan ve dikeve nava ramanên kwîr û heta demekê jî di serê xwe de li tiştina digere û pirsên xweş ji xwe dike: Aya ew ê jî bikari bûya li tiştêkî weha bibûya xwedîpar? Radibe rasterast bi mêrik dişêwire û dibê:

- Cîranê hêja, tu jî dizanî ku sala îsal hinekî bêxwê derbas bû. Zarokan jî dor li min girtine û debara min giran e ... Ez çî

47

serê te bêşînim, bi kurtî ez dixwazim bibêjim ku ... ku ez bi te re werim ba mîr û van lavelavan ez jî bi lêv bikim, gelo ew ê zêrekî nede min jî?

Mêrik li cîranê xwe vedigerîne û dibê: - Ez nizanim, lê ku te divê were.

Mêrik wekî hertim di berbanga sibê de radibe, p~tî destmêj û nimêja xwe derdikeve ber dêrî û dinêre ku cîranê wî ji berê de xwe tev pêçaye û li bendî wî ye. Kî dizane, dibe ku tew wê şevê raneketi be, ji êvar de heta anuha ji bo vî karê xêrdar nimêjên dûrûdirêj jî kiri be. Dûre mêrik û cîran herdu jî didin pey hev û berê xwe didine mala mîr.

Mêrik wek berê dîsa li hafa mîr wan lavelavên xwe dike, zêrekî xwe digirê û bi şûnde vedikişe. Piştî wî, cîranê wî yê nû jî xwe bi pêş de dike û ji mîr re:

- Siba te bi xêr, mîrê min. Xwedê bi te re be! Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike, dibêje û zêrek dikeve destê wî jî. Herdu cîran bi hev re derdikevin.

Hîna di roja pêşîn de dilê cîran xweş dibe. Lewra ev roja ha, ji bo cîrên hêviya riya dewlemendiyê ye. Roj li pey rojê tê û karên herdu cîranan jî her sibe eve. Çavên cîranê nû, her li bendî royên rojên nû ne. Lewra her destpêka rojeke nû, ji bo wî zêrekî zer e. Dilê wî gelek dixwaze ku hemû rojên salê, bi carekê re bihata û di ser de derbas bibûya.

Bi roj û mehan wext derbas dibe. Herçendî dewlemendiya cîranê nû jî çêdibe, lê xwe nagêhîne dewlemendiya mêrik. Lewra wî bi demekî berê dest bi vî karê bêked û bêxwîdan kiriye. Ji ber vê yekê jî çavên cîranê nû

bar nabe û hertim bi raman e. Di ramanên xwe de li riyekê digere ku bi çi awayî xwe bigêhîne dewlemendiya mêrik. Di dawiya dawîn de biryara xwe dide ku biçê giliyê mêrik bi mîr de bike û herweha bi nanê wî bilîze. Bi vê ramanê rojekê bi hilkehilk dibeze hafa mîr û jê re dibêje:

- Mîrê min!.. Bi rastî jî ez têngêhîjim ... têngêhîjim ku meriv çima ewqas bêbext bibin! Ma bîra ku meriv jê avê vexwe, dibe ku meriv keviran bavêjiyê! A wusa ... ma tu nizanî bê

48

do çi bû! Do li filanderê, di civata bêvankesan de li pişt te peyvên nebaş hatin kirin. Ew kesê ku li paş te dipeyvî, cîranê min bû. Ew yê ku em her sibe bi hev re tîn ba te. De êdî tu bi xwe dizanî ... tenê min xwest ku ez, te ji vê nebaşiyê haydar bikim û pê vatiniya xwe bînim cî...

Tiştên ku tîne gotin, mîr her bi rewşek bêhnfere guhdariya wan dike. Cîranê nû jî dibêje û didomîne:

- Di civatê de her tiştên wusa digot ku anuha ez nikarim wan tiştan ji te re bi lêv bikim. Digot: Mîrê me ehmeqekî pênc pera ye, wek golikekî sawa ye! A wusa ... civat jî pê ...

Mîr galegalên wî dibire, destê xwe di piştê wî re dide û dibê:

- «Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike.» Ku ev gotina rast be, wê çaxê ku ew jî çi bike ew ê bi xwe bike, tu tew xwe nerihet neke.

Mîna ku fesadiya wî ciyê xwe ne girti be, cîranê nû dide ser rê û diçe malê. Sibetirê weke hertim ew û mêrikê cîranê xwe tîne hafa mîr, lavelavên xwe dikin, heryek zêrekê xwe digirên û dikin ku êdî vegerin. Lê mîr banî cîranê kevî dike, nameyekê dide dest û jê re dibêje:

- Vê namê bibe vê navnîşanê.

Mêrikê ku giliyê wî hatiye kirin, bi tevgerek giramgîr:

- Li ser ser û herdu çavên min, mîrê min! dibêje û bi cîranê xwe î çavnebar re dikevin rê. Haya mêrikê reben jê tune ye ku cîranê wî yê çavnebar çi daf û feq li pêşya wî danîye.

Di rê de dilê cîranê çavnebar çargopal lê dide û xwe bi xwe dibêje: «HiL. piştî ewqas dewlemendiya ku mîr da wî, anuha jî nameyek diyariyê kete destan. Kî dizane ku di namê de çi nivisî ye, çi qesir û çi dewlemendîl .. » dibêje û ramanên xirab di serê xwe de dicivîne.

Di rê de gelekî dirame ku bi awayekî wê namê ji destê mêrikê cîranê xwe derxîne. Loma dizivire ser û dibêje:

- Cîranê delal, wek ku min berê jî goti bû, cîran warisê cîrên e. De ... ku karê te hebe an jî ku tu nikari bî vê namê bigêhînî ciyê wê, ez dikarim alikariya te bikim û ji dêla te ve ez wê bibim.

49

Mêrikê dilpak dibêje:

- Na cîran. Xwedê ji te xweş be! Tu tew xwe nerihat neke, ezê bibim.

Cîranê çavnebar vê carê destê xwe ber bi mêrik dirêj dike û dibê:

- Na bi navê Xwedê nabe, cîran! Li hember çêyiya ku te bi min kiriye, ku jê dêla te ve ez nameyekê bibim, ma pir e?

Mêrik li ber digere û dibê:

- Na na, cîran! Bi Xwedê ez naxwazim tu ji dêla min ve bibî. Tu tew xwe nerihat neke! Ez ...

Cîranê çavnebar pir namîne ku bi darê zorê namê ji bêrika mêrik derxîne û dibê:

- Bi Xwedê wusa nabe, cîran! Çiqas nebe jî, ez ji te ciwantir û siviktir im. Ez ê di gavekê de bibim û tavilê vegerim jî.

- Na bi serê min û te nabe, ez naxwazim ku tu ji dêla min ve suxrên mîr bikî. Ji salan û mehan carekê mîr suxrekek daye ber min, ez dixwazim bi xwe bikim.

Bi rastî jî mêrik van gotinên ha ji dilekî pak dibêje. Dew-lemendiya di namê de, ne li ser hişê wî ye. Tiştê ku ew difikire eve, ku wî ev suxra jî bi cîranê xwe bida kirin, dikari bû bi mîr jî xweş nehata. Mêrikê reben î dilpak hîna di van ramanên xwe de ye, tew nabîne ku pelhîtek ji kuderê de hat û li paş serê wî ket. Mêrik di nava xwînê de deverû diçe erdê. Jê û pêve jî tiştêk nayête bîra wî û dixewire. Ji cîranê çavnebar wetrê mêrik mir, loma bi destsivikî namê ji bêrika wî derdixe û bi lez ji wir dûrdikeve. Cîranê çavnebar dixwaze bi gavekê zûtir xwe bigêhîne navnîşanê ku dewlemendiyek an jî bextiyariyek hebe, ew biçe li ser rûne. Herweha bi dilpekî xwe digêhîne ciyê namê. Ciyê navnîşanê şikeftê e. Name di dest cîranê çavnebar de ye û dikeve hundurê şikeftê. Çer ku dikeve hundurê şikeftê, dinêre ku kesek li wir tune. Bi duduilî çend gavên din jî ber bi

hundur davêje û li hêla çepê dinêre ku çî bibîne! Du niqrên mezin li ser êgir bilqîna wan e, dikelin. Agirê li binê sîtilan, fena agirê dojecha ku di pirtûkan de tê gotin, no û bi reviyên bilind e.

50

Xofek tamsar dikeve dilê cîrên. Di dest de têdigêhîje. Ra-manek li serê wî vedijîne, lê ji wendakirina namê jî dereng ketiye. Êdî pêre nagêhîne bi şûn de jî vegere. Lewra dema li paş xwe dizivire, dinêre ku derê şikeftê jî hate girtin. Ji nişka ve hawirdora wî bi tariyeke tîr dinuxume. Ji bilî agirên binê sîtilan çavên wî tişteki nabîne.

Dilekî wî dibê ev xewn e, dilekî wî dibê ev xeyal e. Lê hişê ku li serê wî, pê dide zanîn ku ev ne xewn û ne jî xeyal e, kî çî bike bi xwe dike.

Dûre du nîgehbanên sîtilan derdikevin rastê. Her yekî gurzek di dest de û ber bi wî tên. Tirsê dilê wî bêtir dibe û têdigêhîje ku çavnebariya wî bûye boblata serê wî. Nîgehban radihêjin nama destê wî û lê dinêrin. Ya rastî nîgehban dizanin ku di namê de çî hatiye nivisîn. Lewra kesên ku lingên wan bi vir dikevin, ji bo mirinê ye û pirs jî jê nayên kirin. Ango wek her nama ku digêhîje vê navnişanê, bi hevokê kin û kurt di vê namê de jî weha hatiye nivisîn: «Ev merivê ku tê wir, bê pirs û bê bersiv bavêjin niqra qetranê!» Bêyî ku zêde dereng bixînin, nîgehbanên sîtilên qîr û qetranê vê fermana mîrê xwe bi cî tînin.

Ew mêrikê reben î ku pelhît li serê wî ketiye, sibe tirê dîsa radibe û derdikeve der. Lê mîna ku ji cîranê xwe êşiya be, êdî li ber derî li bendî wî nasekine. Bi tena serê xwe dikeve rê û berê xwe dide mala mîr. Lê vê carê bi serekî pêçayî û hinekî jî şermezar e. Lewra mîr, salê carekê suxrekek dabû ber û wî jî bi cî ne hanî bû. Mêrik bi xemgînî û şermokî derdikeve hafa mîr. Piştî gotinên xwe yê hertimî û girtina zêrekî, mêrik dike ku êdî vegere. Mîr têdigêhîje ku çî bûye û çî qewumiye. Lê dîsa jî bi derketina mîrik re bi dengê banî wî dike û jê re dibêje:

- Ka te çî kir? Min do nameyek dabû te ... Te name bi silametî gîhand ciyê wê, an ne?

Mêrik hustuyê xwe xwar dike û bi şermezarî;

- Ez çî ruyê xwe ji Xwedê, ji mîrê xwe reş bikim, dibêje û tiştên ku bi serê wî de hatine yek bi yek ji mîr re kat dike. Ji xwe serê wî yê pêçayî jî rastiya gotinên wî dide xuyakirin.

51

Mîr wê çaxê destê xwe di piştta mêrik re dide û dibê:

- Rast e, «Kî çê bike bi xwe, xirab bike bi xwe dike,» Mêrik bi raman ji ba mîr vediqete û berê xwe dide mala xwe.

52

MIRINA AXA

Li gundekî axayekî bi nav Û deng heye. Wî ev nav û dengê xwe jî bi darê xwe î zorê girtiye. Gundiyan ewqas dêşîne, ewqas xirabiyên bi wan dike ku hemî gundî ji siya wî qutifîne, Pirî dê û bûkên vî gundî, zarokên xwe bi tirsê navê axê ditirsînin, dihewînin, dikine xew û ji dergûşên xwe re dibêjin: «Dengê xwe bibirin, axa ê were ha!»

Wek her aferîdekî Xwedê, rojekê ev axayê bi nav û deng jî dikeve nava nivînan û li bendî mirinê ye. Hemî jin, mêr û za-rokên gund, ji kuçê heta ber deriyê hewşa axê, û ji ber deriyê hewşê heta ber serê axayê nexweş, li paş hev ketine rêzê. Herçendî mirina axê bi gundiyan xweş jî bihata, ji tirs û xofa ewqas salan, diviya bû ew bihatana sikrata axayê xwe. Û loma ew jî anuha li vir, di rêzê de ne.

Di sikratê de hinek gundî bi raman in, hinek bi girî ne û hinek jî bi çavên şilekî ne. Lê pir baş dixuye ku şilekiya çavên weha ji kêfxweşiya dilên tirsek e. Lewra dilop ji wan çavan nayêne xwarê. Tenê dora bijangên reş şil dibin û hew. Ji xwe ji wan gundiyan çavşilek, pirî wan çavên xwe mist didin, mist

53

didin heta ku dora-wan şil dikin.

Gundî li bendî wesiyetname axayê xwe ne. Dipên ku axa ji wan re bibêje: «Heqê xwe li min helal bikin, gundiyan hêja, lewra min hûn pir êşandin» Lê na! Axa wesiyeta xwe ya li ber mirinê jî wek fermanekê di ser gundiyan de dirijîne û dibê:

- Ku ez mirim, divê hûn xelesa bîn bavêjin hustuyê min û cendekê min bibin bi dara nava gund de daliqînin!

Gundiyan ku van gotinan ji devê axayê xwe dibihîsin, di cî de mitûmat dimînin û bi awakî bêreng li hev dinêrin. Lêv li hecî û sofîyan dilerizin û pifi dora xwe dikin. Kes newêre tiştêkî jî bibêje. Lê rîsîpiyek xwe li ber serê axayê xwe pan dike û dibêje:

- Axayê me, ma tew tiştêkî weha dibe?! Em ê çawa cendekê te î pîrozwer li rasta gund bi darekê ve daliqînin?.

Axayê gund di nava nivînên mirinê de jî axatiya xwe dido-mîne, gefekî lê dixwe û dibê:

- Ez hîn ne mirime. Ku ez mirim jî divê hûn bi ya min bikin! Ez çî ji we re dibêjim, hûn WÎ bikin û hew!..

Tev rîsîpî, hemî gundiyan li dora nivînên axê di bédengiya xwe de dimînin. Gelek nabuhure, axa çavên xwe dide hev û xwe di nava nivînan de ker dike.

Axa dimire. Hemî gundî ji derve de xemgîn û ji hundur de kêfxweş in. Lê kêfxweşîyeke veşartî ye. Lewra hîn jî bi çavên xwe bawer nakin ku axa miriye û careke din jî ranabe. Ne tiştêkî rihet e. Kî dizane, dibe ku ew tirs û xofa ku axê xistiye dilê wan, hîn heta demeke dûrûdirêj jî xwe li wan bide xuyakirin. Loma, gundî li ser daliqandina cendekê axê bi hev dikevin û dibêjin:

«Ma em çawa diwêrin bi gura axê nekin?!»

«Bi Xwedê ez tew têngêhîjim ku axê çima ev wesiyetname xwe li me kir»

«Ez bawer im ku axa hîn nû têngêhîşt ku WÎ çiqas em êşandine. Loma ew dixwaze bi dest û devê xwe, xwe biarihîne,» «Ero weUe, ez dibêm axayê rihmetî êdî xerifi bû, loma ... » «Lawo de zêde devsistîya meke!»

54

«Ez bi gorî, hûn werin em bi gura axê bikin û wesiyeta wî bi cî bînin. Ma hûn çima serê xwe di ber de dêşînin, Axa dizane, dikane û wî ev tîştê ji me xwest»

Herweha gundî li hev dikin ku wesiyetname axayê xwe bi cî bînin. Û wusa jî dikin. Cendekê axayê xwe dibin di nava gund de, li bin darekê datînin. Hilboqa benekî davêjin hustuyê cendekê axê û ber bi jor dikêşin, Cendekê

axê bi dara nava gund ve li ba dibe. Bi qasî çend saetan wext dibuhure, gundî her li dora darê rûniştine û li cendekê axayê xwe temaşe dikin.

Lê ji nişka ve du cendirme bi gundiyan ve xuya dibin.

Cendirme bala xwe didine gundiyan ku çî bibînin. Merivek bi darê ve daliqandine û bi xwe jî li dorê temaşe dikin. Cendirme zûzûka xwe digêhînin wir, cendek ji darê dadixin, ji bilî jin û zarokan hemî gundiyan didine ber xwe û dibin ba mezinên xwe. Li wir li gundiyan dixin.

Herçiqas gundî li ber cendirme û mezinên wan digerin, xwe davêjin bextê wan û ji wan re dibêjin, «Ev wesiyetname axayê me bû,» lê ne cendirme û ne jî mezinên wan guhdariya gotinên gundiyan dikin. Tepîn û repîna cendirman e bi ser gundiyan ve dikin. Rîhên hecî û sofîyan têne kişandin û şewutandin, dev û pozê xortan xwîn dibin, hewar û qêrîneke dilşewat her zîz û bilind dibe. A di wê gavê de dengê dilşewatir ji nava gundiyan bilind dibe û dibê:

- Hewar ji te Xwedêyo!.. Ev çî kevir û kuçik bûn te li me barand! Ev mir jî ... mir jî em jê pak ne bûn, bavo! Ev çî bû, çî teba bû!..

55

ÇAVNEBARÎ

Di gundekî de çiqas meriv dijîn û bi çî rengî dijîn bila bijîn, ji rûniştvanên gund hinek kes bi rengên xwe yên taybetî têne nasîn. Ser qisê axa, şêx, mele ... Ev rengên ha bi hebûn û hinek nexşên xwe yên taybetî xwe ji civata gund cuda dikin. Lê em yekî êzîdî jî li van rengan zêde bikin û dest bi mijarê bikin. Lewra ev yê êzîdî jî, ji bav û kalên xwe de li vî gundê ha dewlemend e. Hebûn û dewlemendiya van her çar kesan, ji yên gundiyan din zêdetir e û di gund de jiyana wan jî bi awayekî taybetî ye.

Lê piştî demekê çav li axê sor dibin û êdî bi babetekî din li dor xwe dinêre. Bextreşî dikeve dilê Wî. Şev û roj difikire, xewên şevan li xwe diherimîne û li hinek zexeliyan digere ku bi awayekî zeviyên şêx, mele û yên êzîdî bi dest xwe bixîne. Ev ji bo Wî gelekî ne dijwar e. Radibe di demeke kurt de banî şêx û melê dike, bi wan re civîneke dîrûdirêj li dar dixê û di gotinên xwe de weha dibêje:

- Naha em ji olekê ne. Tu şêx û ev jî melê gund me ye. Ma çima êzîdî di gundê me de bijîn? Ma ne ... ew neyarê ola me

56

ne!... Ez baş nizanjm lê ... lê ku hûn baş li ola Mihemed bikolin ... Ku tu kesekî nizani bûya jî, diviya bû we bi xwe ji me re bigota û we em li ser vê yekê şiyar bikirana. Na, na ... divê em vî neyarê ola xwe, ji gundê xwe biqewitînin. Wusa xuyaye nanê ku di gewriya me de diçe jî heram e. Ew êzidiyê bavftle divê ji .gundê: me biqewute û ji ber çavê me wenda bibe. An ne ... nabe.

Şêx û mele serê xwe dixin ber xwe, mîna ku bibêjin «Erê welle wusa ye». Axa, şêx û mele li wir qisên xwe yek dikin, biryara xwe didin ku li êzidî bidin û wî ji gund derxînin. Li ser van sedeman banî yê êzidî dikin û dibin ciyekî xewle. Li wir hetanî ku êzidî ji hiş û hêle dikeve, li wî didin. Êzidî bi rabûnê re xwe digihîne gund, bi wî bayî re ji wir bar dike û zeviyên wî ji axê re dimîne.

Êdî mîna ku devê axê li xwînê keti be, serê xwe di ber hinek lîstikên din de dêşîne. Ev jî ji bo bi destxistina zeviyên şêx û mele ye. Axa rasterast diçe ba şêx û jê re dibêje:

- Şêxê min, ez fikirîm ... gelek fikirîm ku ciyekî zane û ilim-fereyekî nola te lê be, çawa dibe ku meleyekî qûnbigû radibe wekîliya Xwedê dike?!.. Şêxê me li ser herdu çavên me! Lê bi rastî jî ciyê ku tu lê bî, tew jî hewceyî meleyekî ber dîwaran nake. Ew ê jî naha rabe seriyekî bajo. Ango ez dibêjim ku bila ew li nava lingan negere.

Axa li wir bi zimanê xwe yê sor û bi dek û dolabên xwe, serê şêx jî dişo, Bi hev re diçin nik melê, bêyî peyv û bê sedem, ne dibêjin yek û ne dudu ... heta ku mele ji zik dibe, repik dikin û lê dixin. Di pey lêxistinê re mele jî bi rev direve û ji gund koç dike. Herweha zevî û bîstanên melê jî ji axê re dimînin.

Axa bi viya jî nahewe. Vê carê jî difikire ku şêx ji gund bi-qewitîne. Lê êdî kesekî ku jê bipirse an pê bişêwire ne maye. Hema rasterast diçe ser zeviyê şêx, Bê silav û bê bereket devê xwe vedike.

- Ero, ma êdî ji te re ne bes e! Li gundê ku axayê mîna min tê de hebin, şêxê parsek î nola te çima dibe xwedî bax û

57

bîstan, ez têngêhîjim!?

Axa li wir, şêx jî ji hal dixîne. Deng û hewara şêx hetanî şî-vanên serê çîyan diçe. Lê ne Xocê Xizir, ne Xwedê û ne jî hewariyên Îsa di hewara wî de tîn. Herweha şêx jî li ber axê tewatiyê nagirê û ew jî ji gund bar dike û diçe.

58

BÎSTAN

Jin û mêrekî gundî, karê xwe î li bajêr hîna nû qedandine û anuha her yek li kerê xwe î vala siwar bûye, di riya gund de bi peyv, henek û şorgemî ber bi gund diçin. Mijar namîne an jî nayê hişê wan ku li ser napeyivin. Ji ber ku riya gund dût e, ew jî ji xwe re her dipeyivin û dipeyivin. Pez, dewar, karûbarên gundiyan, jiyana gund û bajêr, zarok. .. tew jî jî carina xwe ji bîr dike û hetanî pêwendiyên mêr û jinan jî zimanê xwe dirêj dike û mîna ku tiştêkî bi ber guhê mêrik bixîne.

Di destpêka rêwitiya xwe û jinikê de, mêrik zêde guhê xwe nade jinikê, pirî gotinên wê di ser guhê xwe re davêje û tew guhdarî jî nake. Lê piştî gelek galegalên weha, tiştêkî şeytanî xwe di dilê mêrik de jî dilivîne. Lê rewşa mêraniya wî dest nade ku ew jî wek cîrana xwe ya gundî çêlî hinek tiştên sernuxumandî bike. Ji vê dilxirabiya wî û pêve, peyvên cîrana wî bala wî dikişîne, guhê xwe dide ser û pirî caran şorgermiyên li gor dilê cîrana xwe, ew jî dike. Lê zêde jî nikare xwe pêve berde.

Riya herdu gundiyan digêhîje bîstanekî zebeşan û anuha

59

di ber bîstên re derbas dibin. Bîstanekî gelek fere ye. Wusa xuyaye rêwîtiya wan ê bi qasî saet û nîvekî jî di ber vî bîstanî re bidome. Lemên zebeşan xwe li ser vî erdê mezin î sor belav kirine, û zebeşên belek di nava xwe de nuxumandine. Tenê ew zebeşên mezin bi ser lemên xwe ketine û wek 13şê berxan piştî xwe dane tavê. Di vê payîza paşîn de çiqasî dilê merivan dibije xwarina wan, Xwedêyo! Mêrik û jinik di ber bîstên re, li ser piştî kerên xwe bêdeng dimeşin. Mîna ku tiştêkî hati be hişê jinikê, li mêrik vedigere û:

- Ero cîran, ez dikim tiştêkî ji te bipirsim, dibêje û bi vê gotina xwe cîranê xwe jî ji ramanên wî dîrdixîne. Mêrik di bin çavan re li jinikê dinêre û dibê:

- Kerem bike, cîran. Te ê çi bipirsiya?

Jinik rasterast li simbêla cîranê xwe dinêre, destê xwe ber bi hêla bîstanê zebeşan bilind dike û bi pişirîn dibêje:

- Ez dibêm ... Ku ev bîstanê te bûya û yek têteta nav bîstanê te û jê biçiniya, te ê çi bikira?

Mêrik herdu destên xwe di ber xwe de ve digirê û dibê:

- Ne ev bîstanê ha dibe bîstanê min û ne jî yek ketiye nav ...

Jinik zûzûka gotina wî dibire û pîrsa xwe ducar dike: - Em bibêjin, ku ev bîstanê ha yê te be. Lê wê çaxê? ..

Vê carê mêrik wekî berê zû bi zû bersiva jinikê nade. Hinekî difikire û dûre li cîrana xwe vedigerîne:

- Ez çi dizanim, cîran. Ku ev bîstanê min be, wê çaxê divê meriv bizani be ka ew î ku dikeve nav kî ye. Ku ... ku rîsipyekî pîr, an jî zarokek be, meriv ê nikari be deng bike û ...

Jinik dîsa peyva mêrik di devê wî de dihêle û dibê:

- Na na, ne rîsipî û ne jî zarok ... ku jinek têtewe nav ... jini-keke nola min, hinekî xweşik û navsere ... de ka rast bibêje, tu ê çi bild?

Mêrik dinêre ku cîrana wî rasterast tiştêkî dixwaze. Ew jî dizivire ser cîrana xwe û jê re dibêje:

- Wê çaxê ez ê jî bi hustuyê jinikê bigirê û di nav lemekê de dirêj bikim û dûre jî tu dizanî ew ê çi bibe.

Bi vê gotina mêrik re kenekî wusa zirav û wusa dirêj bi ji-

60

nikê dikeve ku, pîr namîne jinik ji ser piştta kerê de gêrî xwarê bibe. Lê piştî ku ken lê sivik dibe, di ber kenê xwe î hûrik re dibêje:

- B3ş e, cîran. Em bibêjin ku ev bîstanê te ye, ez jî jinek im û va ye ez ketime nav!..

Bi vê peyvika xwe ya dawîn re, jinik xwe ji ser piştta kerê berdide xwarê, dikeve nava bîstan, bi çend gavan di nava bîstên de diçe, li ber lemeke zebeşê disekine û li wir li mêrik dinêre.

Mêrik ji dût ve weha carekê li cîrana xwe ya hinekî xweşik û navsere dinêre, dilekî wî dibêje xwe gunehkar meke, dilekî wî jî dibêje ev bîstanê

ha ê rojekî xenîmî çavên te bibe û şeytan jê re dibêje biçe. Mêrik tew nizane ku ew çawa ji kerê daket, çawa heta ber lema zebeşê çû, çawa bi hustuyê jinikê girt û di nava lemê de dirêj kir.

Piştî nîv saetekê herdu gundî dîsa li ser piştta kerê xwe ne û ketine rê. Ew henekên ku bi qasekî berê bi peyv û awakî devkî bû, anuha bûne henekên bi dest û lep. Mîna ku nola berê ji hev şerm nekin, êdî li ser piştta keran jî destdirêjiya hevdu dikin. Di navberê de nîv saetek derbas dibe, jinik dîsa xwe ji ser piştta kerê davêje xwarê û vê carê bi ken dibêje:

- Em bibêjin ku ev bîstanê te ye, ez jî jinek im û va ye ez ketim nav bîstanê te.

Jinik heta ber lemek zebeşê dibeze û li wir dîsa li mêrik dinêre. Mêrik jî ji kerê xwe peya dibe û dikeve nava bîstanê xwe. Lê vê carê ne bi qasî cara pêşîn dudilî û ne jî dilpekîn e. Wusa dixuye, wî hay ji diza bîstanê xwe heye û ew dizane ku ew ê çi bi wê bike. Herweha mêrik diçe û tşê ku ew dizane, dixwaze, dikane, dike û piştî bîstekê tev diza di nava bîstanê xwe de, ji nava bîstên derdikeve ..

Di navberê de bi qasî bîst deqeyekê wext dibuhure. Rêwiyên li ser piştta keran mîna ku ji rê westiya bin, êdî ne henekên devkî û ne jî henekên lepî bi hev dikin. Nêzîkî li kujê bîstanê mezin kirine û hindik maye di ber bîstên re bibuhurin û derbas bibin. Jinik dinêre ku bîstan ê li dû wan bimîne. Loma di vê gava dawîn de jî ji kerê dadikeve, dibeze nav bîs-

61

tên, li ber lemekê disekine, berê xwe dide mêrik û wan gotinên xwe yên berê dicarîne. Lê mêrik ji kerê xwe peya nabe. Di ber xwe de serê xwe dihejîne, bi awakî sist û bêçare li cîrana xwe vedigerîne û dibê:

- Binêre, cîrana hinekî xweşik û navsere. Ku bi rastî jî ev bîstana bîstanê min be, û tu jî dizeka bîstanê min bî, bawer bike ku ez ordiyek leşger jî bidim ber vî bîstanê xwe, ew ê nikari bin çavdêriya bîstanê min bikin.

62

BtUNTENGt

Jiyan, gelek rewşên xwe yên bêhtengîn hene. Ne pêwîst e ku meriv bide diyarkirin ka bêhna vî merivê ha, merivê ku em ê çêlî wî bikin, ji çi teng bûye. Lê ku em bibêjin bêhna wî ji wî bi xwe teng bûye, wê çaxê ne em ê

çîrokê dirêj bikin û ne jî em ê çilkên xirab bavêjin xelkê. Belê belê, bêhna wî ji wî teng e. Û anuha ji bo ku hinekê bêhna xwe fireh bike, hêdî hêdî di ber çemekî de dimeşe û diçe.

Tavên buharê girtine serê çiyê û wek gwîşiyên tiriye reş di ser de xwar bûne. Bi qasî nîv saetekê mêrik her dimeşe, hêwa paqij didewusîne hundurê xwe û berdide. Ji bo ku sedema bêhtengiya xwe ji bîra bike, carina ji xwe re difikîne. Dûre hinekê diweste, li kêleka çem, li talda zinarekî xwe dide erdê, li kulîlkên dora çem temaşe dike û guhdariya xuşîna ava çem dike. Lê na, ne bîna pûng û kulîlkên peravê çem û ne jî xweş-dengê xuşîna avê dilê wî xweş dike. Serê wî her bi tiştên xirab dagirtî ye û pê xwe diqahirîne.

Lê ji nişka ve ew tavên reş di ser hev re wusa diguricin, wusa dikine şîrqeşîrq ku pir namîne mêrik ji binê zinêr bi-

63

pengize Û bibeze. Dûre jî mîna ava ji devê kunekî birije, baranek tê xwarê. Mêrik xwe bi şûn de dikişîne binê qefê zinêr, bi dengê baran û ava çem re dikeve xeyalên kwîr.

Piştî gavekê nalînek ker û nîvxeniqî dibîhîse. Mêrik ji nişka ve bi xwe dihesa ku di binê qefe de ye. Çemê li pêşberê wî bûye laserek tirsdar, bi hingeme qirşûqal û darûberg dane ber xwe û diherike. Çavê mêrik her li vê ava tevlihev û şî10 ye, bi xof lê dinêre. Di nava pêlên vê laserê de laşê merivekî ber bi çavên wî dikeve. Carina bi ruyê avê dikeve, carina binavî dibe û li ber pêlan serûbinî hev dibe. Lê tiştê ku pir bala mêrik dikişîne eve ku dema laş bi ruyê avê dikeve, bi dijwarî ziman lê digere û bi dengê nîvxeniqî dibêje:

«Şikir ... ji viya re jî şikir ... şikirl.,»

Mêrikê bêhteng gelekî lê dimîne heyirî û bi mitûmatî li ava laserê û li laş dinêre. Laş li ber mirinê ye. Aya ev «Şikir, şikira ha ... ji bo çi ye?» Mêrik dike ku di hewara wî l3şl de biçe û wî xelas bike. Lê bêkês e. Çavên wî jê nabire. Çi rewşeke teng û xirab!..

Mêrik bi qasekî pir kurt xwe dixwe dewsa wî l3şl, dijewariya ku ew tê de di xwe de hîs dike û her li ser difikire. Lê gelek nabuhure, ew laşê ku li ber pêlên laserê şikiriya xwe dihanî, diçe li gomiyekî qeraxê çem dikeve û serî

lê felqe dibe. Ew laşa tevî seriyekî bi xwîn serûbinî pêlên soringîn dibe û diçe.

Mêrikê li ber zinêr çavên xwe her li laserê digerîne ku bizani be ka çi bi serê laş de hat. Lê dema ku dibîne laş bi ser avê dikeve, ew hîn jî bi wî dengê xwe î bêhêvî şikiriya xwe tîne û dibê:

«Şikir ... ji viya re jî ... »

Di binê zinêr de mêrik pir difikire lê tiştêkî ji hev dernaxîne û têngêhîje ku ev laşê ha, hîn ji çiyê xwe re şikir dike. Lê mêrik êdî bêhtengiya xwe ji bîra dike û her bi wî lîşî de dikeve. Ev laşê ha pir bala wî dikêşîne û hîn jî dema ku bi ruyê avê dikeve, diyar e ku şikiriya xwe tîne. Lewra deng jê nayê, lê lêvên laş her dilivin.

Pir derbas nabe, dibîne ku laş çû li pîjekî ber qeraxê çem dikeve, pîj li zikê wî dikeve û di piştê wî re davêje der. Ev dî-

64

rok û çîroka laşê li ber laserê, di navbera çend saniyan de di-qewume. Lê mîna ku mêrikê bêhteng sed û sê salan jiya be, dîti be û têngêhişti be; li lîşî dinêre, hêdîka radibe ser xwe û xwe bi xwe: «Xirabtirînê rewşên xirab jî hene, şikir ji ... » dibêje û bi şûnde vedigere. Di vegeerê de bêhtengî li ser ne maye, lê serê wî vê carê bi gelek tiştên din dagirtî ye.

65

XORTt BARXWAR

Xortekî êzing li kera xwe bar kiriye û ji êzingan tê. Bar jî, barekî giran. Ku meriv rastiye bibêje, kera wî di bin barekî wusa de ranabe. Lewra kereke piştikul e. Ji bilî giraniya bêr û piştuliya kerê, hinek sedemên din jî hene ku meriv bibêje. Serqisê: Ker bi kurtaneke jihevketî ye, paldûma wê qetyaye, navtenga wê sist e ... Ji ber vê yekê jî dema ker gavên xwe bi pêş de davêjê, ji bêgavî xwe li her aliyê xwar dike û di rê de wek hêlkanekê diçe û tê. Bar li ser piştê kerê nahewe. Serî gavê xort dibeze, diçe pêşiyê li kerê digirê, barê wê hildukute, destê xwe di ser de dide, çi dike nake bar li ser piştê kerê cî nagirê û nasekine. Her gaveke kerê mîna ku lê bibe riya salekê, intîn pê dikeve û firnik lê fere dibin.

Di vê rewşa dijwar de ku Xwedê li ruyê kerê binêriya û ziman têxista devê wê, ew ê jî li xort vegeeriya û jê re bigota:

- Ji bona Xwedê, xorto!.. barê ku ez ê nikarim di bin de rabim, nede ser pişta min û mêraniya xwe li ser pişta min neke!..

Lê mixabin ne Xwedê li ruyê kerê dinêre, û ne jî ker di-

66

kare bi vî awayî aqilekî bide xort.

Anuha xort li pey kera xwe ya bargiran e û di ber axpînekê re derbas dibe. Li navaxpînekê çavên wî bi keçeke berzewac dikeve. Keçikê serê xwe xistiye ber xwe û eşêfa pîvazan dike. Bi vê bergehê re, xort li pey kera xwe ya bargiran û pişturmî, xwe qure dike. Mîna ku ji keçikê re bibêje: «Ez dikarim barên wusa jî ji çiyê bînim û bi tena serê xwe min ev barê ha derxistiye.»

Lê xort dinêre ku ev barê wî yê ewqas giran, tew jî bala keçikê nakişîne. Dilê xort gelekî dixwaze ku keçik carekê li ser piyê xwe vegeriya û ev barê wî bi roniya çavên xwe bidita. Tûlika xort ba digirê û serê xwe radike.

Xort dinêre ku wusa nabe. Keçik her bi eşêfa xwe daketiye û tew bala xwe nade xort û barê wî yê pir. Li ser vê yekê xort radibe destekê xwe davêje barê xwe ku neqelibe, destê din jî dike kêleka xwe û dest bi fikandinê dike. Difîkîne lê, dengê fikandinê jî naçe keçikê ku li ser piyê xwe bizivire û lê binêre. Lewra heta ku wî ev barê ha derxistiye û ji çiyê daketiye, ji tîna dev û lêvên wî hişk bûne û poz lê xetimiye. Ew dengê fikandina ku ji devê wî derdikeve, mîna dengê şûşekê devşikiyayî dike fistefist. Radibe vê carê bi çend dangan dikuxe, lê dîsa jî deng naçe keçikê. An jî ev dengê ku diçe keçikê, tew jî bala wê nakişîne ku pê bizivire û li xort binêre. Xort çî dike nake, ji bona Xwedê keçik carekê jî berê xwe nade xort û lê nanêhire.

Ev daxwaza ha di dilê xort de dibe wek kulekê û gelekî li ber xwe dikeve. Bi viya jî namîne, ditengije û hêviya wî dişikê, bêhna wî teng dibe, heta ku jê tê çoyê xwe bi hêrs radike. Û datîne, rep ... rep ... rep ... li kerê dide ku keçik bi dengê repîna çî hay ji wî bibe. Weke wî, ker jî tî û betilî ye. Lêxistin û zorkirina xort jî li ser pişta wê tiştêkî zêde ye. Piştî du sê repînên pêşîn, ker pişta xwe xwar dike, bar li ser pişta wê diqoqize, xort jî êdî pê re nagêhîne ku bar li ser pişta wê serast bike û herweha bar diqelibe.

Di vê navberê de awurên xort û keçikê bi hev dikevin. Lê vê carê jî dilopên xwîdana şerm û westê, li ser eniya xort tev-

67

lihevî dibin Û wek moriyan têne xwarê. Xort zûzûka xwarî barê xwe dibe, werîsê xwe ji heçî difilitîne û benkênxwe ji nû ve datîne. Dûre werîsê xwe li ser piştta kerê amade dike û di vê navberê de jî carina di bin çavan re li keçikê dinêre. Lê keçik her wekî berê mijûlî eşêfa pîvazên xwe ye. Ji tîbûyîn û westiyanê êdî çavên xort jî jê nabire ku bi tena serê xwe bikari be vî barê xwe li ser piştta kerê bişidîne. Loma radibe ji bêgavî li keçikê dinêre, bi du dangan banî keçikê dike û bi xemgînî dibêje:

- Erê ... xwenga dilovan!.. ma tu bi xêra bavê xwe alîkariya vî barê min nakî?

Keçik li ser piyê xwe dizivire, li xort dinêre, bêyî ku deng bike ji ciyê xwe radibe, hêdîka pêşa xwe di ber xwe de dawdişîne Û bi gavên dilovan ber bi xort û barê wî yî qelibî diçe.

Barê xort li ser piştta kerê tê şidandin, beriya ku ji wir dûrkeve, xort li keçikê vedigere û dibê:

- Mala te ava, xwenga min! Xwedê û pêxember ji te XWeş be, dayika min!..

Piştî çend gavên pêşîn, serê xort tevlihev dibe, li pey keçikê dinêre û di dilê xwe de weha dibêje: «Ez bawer im dilê wê kete min loma ... loma hat alîkariya min kir.»

Bi hatinê, xort nêzîkiyê li gund dike. Li perê gund, li ser bîrê çend keç û bûkên gund genim dişon. Xort gelekî tî bûye. Zûzûka xwe digêhîne bîrê, du sê lingan bi bîrê de diçe, xwe xwarî avê dike û mist bi mist di gewriya xwe ya ziwa de berdide xwarê.

Piştî ku têr avê vedixwe, xwe rast dike ku êdî hilkişe jor.

Lê dema ku xort piştta xwe rast dike, ji nişka ve dewxa wî diçe, çavên wî reşve diçin, gêj dibe û dikeve bîrê. Ya xirab, xort bi avjenê jî nizane. Di bîrê de dest û ling lê dibine dar û dimîne. Carekê duduyan diçe binê avê û tê ser. Keç û bûkên li wir, dinêrin ku xort ê li ber çavên wan bifetise. Ji wan yeke bi destûpê, daw û delingên xwe hildiçine, çend lingan di bîrê de diçe xwarê, dadide tûlika xort û dikişîne derve. Li ser devê bîrê xort

deverû li erdê dirêj dikin û ew hemû ava ku bêhemd keti bû zikê wî, ji dev û pozê wî diherike der.

68

Heta demekê jî xort li wir bêhiş dirêj kirî dimîne. Dûre çavên xwe vedike ku çî bibîne, ew hemû keç û bûkên li ser bîrê dor li wî girtine û di ser re sekinîne. Di nava xwîdanek bêreng de radibe ser xwe, sipasî û malavatiyan li wan dike û dîsa dikeve rêya xwe.

Di rê de diponije, vê rewşa xwe ya dawîn şirove dike û di dilê xwe de weha dibêje: «Keçikek berzewac û xortûxama ... di nava ewqas hevalên xwe de ... ku bêşerm destê xwe bavêje xortekî nola min û ... ev ji sedî sed tê wê manê ku ... ku dilê wê kete min. Lê ji wan kîjan bû?. Kîjan dibe bila bibe, ne girîng e. Ya girîng ev e ku ji wan yek dilê wê kete min ... û ev tenê jî têr dike,»

Xort bi van ramanên xwe ketiye nava gund û anuha li pey kerê xwe di ber hewşeke mezin re derbas dibe. Ji ser piyê hewşê kûçikê girî mîna hirç, ji nişka ve xwe davêje ser xort, dev li çîpa wî dike, davêje erdê û li erdê digevizîne. Qêrîn û hewarek wusa bi xort dikeve ku dilê kûçikê mîna hirç jî pê dişewute. Hemû kesên di gund de, vê qêrîna wî dibîhîse û ber bi hewara wî dibezin.

Di lihevhanînên çîrokan de meriv pirî caran rastî tiştên weha tên. Ango dîsa. Dîsa keçeke xweşik xwe beriya hemû gundiyan digêhîne hewara xortê reben. Hejekî dirêj di dest keçêkê de ye, ne dibêje yek û ne dudû, li nava çavê kûçikê girî dide. Kûçik xwe li ber hejê keçikê nagirê, dev ji çîpa xort berdide û rev bi rev direve. Vê carê jî xwîn di çîpa xort de nasekine. Keçik bi lez dest davêje temeziya serê xwe û temeziya sor li çîpa xort dipêçe.

Xort hew carekê dinêre ku çend gundî di ser xort re sekinîne û dilê xwe pê dişewutînin,

Xort radibe ser xwe, ling dide ber xwe û hêdî hêdî li pey kerê xwe dimeşe, Çîpa wî lê giran bûye û dêşe, lê dilê wî xweş e. Lewra vê carê keçikekê tew temeziya xwe jî li çîpa wî pêçaye. Loma xort di kêfxweşiya ramanên xwe de weha dibêje: «Ku dilê vê keçikê neketa min, ma tew dikarî bû ew

kûçikê gir î mîna hirç ji min biqetanda? An jî ku ne wusa bûya, çawa beriya hemû gundiyan xwe digîhande hewara min? Lê ev te-

69

meziya wê ya sor?. ev jî dide xuyakirin ku dilê wê kete min ... û kî dibêje çî bila bibêje ... temezî bi xwe jî xelata vê dilketinê ye û hew ...

Xort bi van ramanên xwe yên XWeş li pey kera xwe dikule û anuha ber bi kuça mala xwe diçe.

70

ARDÛ

Bavekî pîr û keça xwe di binê maxên xaniyekî mezin de bi hev re dijîn. Salên mêrik derbas bûne û êdî li ber mirinê ye. Lê salên meriv çiqas zêde dibe bila bibe, ne gengaz e ku meriv bi roja mirina xwe bizani be. Ev merivê ha jî anuha di mal de mîna ku li bendî wê rojê be, her bêhêvî, dijî. Destên xwe ji darûberên dinê birîye û mîna ku bibêje: «Ma lingekî min li vê dinê û yê din li dinêya din e.» di hundurê vî xaniyê mezin de xwe li ser piştê radimedîne, her li siryaqên xênî temaşe dike, bi vî awayî gavên vê jiyana xwe ya dawîn dijmêre û dibuhurîne.

Salên keça wî ne piçûk e, lê hîn ne zewuciye. Xwedê dizane di mal de maye û li gor ku tê gotin, ji bo keçek berzewac jî malxirabiya herî mezin ev yeka ye. Ca bifikirin ku keçek xor-tûxama ji dara zewacê fêkiyekî neçine û jê netamije! Loma pêlên reviya agirê ku di dilê wê de roj bi roj ba digirê, di xwe de dişewute, vedimire û xwe bi xwe dihele. Xwedê kesî bi rewşek wusa ne helîne! Ji serê sibê heta êvara teng, çavên xwe li dora xwe digêrîne, tew carina di xewên şevên nîvê şe-

71

van de jî xewn û xeyalan dide ber hev ku rastî hêviyeke piçûk bê. An jî ew li bextekî XWeş rast were. Demên keç û bavî bi vî hawayî derbas dibin.

Ji payîzan payîza salekê ye. Xelkên gund pirî karên xwe yên havînê qedandine û dest bi karê payîzê kirine. Ji karên payîzê karek jî, berhevkirina ardû ye. Xelkê gund jî anuha dest bi vî karî kirine. Ji bo ardûyê zivistanê, yên ku li çolê sergînan berhev dikin û tînin malê, yên ku li ser sergoyên gund tar û tepikan çêdikin, yên ku li çiyayên hejîk û êzingan derdixin û dikişînin malên xwe ... Bi kurtî herkes mijûlê tiştê ye.

Lê ev mêrikê pîr û keça xwe her di ramanên rewşa xwe de ne û diponijin. Mîna ku destên wan li jiyaneke wusa bêmane sar bû be, ji bilî pêwîstiya karê rojane destê xwe navêjin karekî din. Serqisê: Tew jî serê xwe di ber de nahêşînin ku piştî hefteyekê an jî meheke din ew ê çî çawa bibe. Zivistana ku di ser wan de bihata jî ne li ser guhên wan e. Kî dizane, dibe ku pîremêr suxra hanîna ardûyê salê disipart keça xwe, an jî keçikê ev kara di ser pîremêrê bavê xwe de berdida. Lê tiştê ku bala merivan dikişîne, ne bav û ne jî keçik çêlî ardû, an jî pêwîstiya tişteki weha dike. Rojên Xwedê li hev diqelibin, demên germeron xwe disipêre çend rojên payîza paşîn. Bi gotineke din zivistan li ber derî ye û keç û bav di malê de hîna li bendî hevdu ne.

Rojekê dikeve bîra keçikê an jî dide zikê wê ku wan ardû nîne. Beriya ku ji bavê xwe bipirse û wî ji vê rewşê haydar bike, keçik gelekî difikire, diponije û xwe bi xwe weha dibêje: «Aya ev bavê min î kal çima xwe nalibitîne? Qaşo ewqas zivistanên salan, zivistanên sar û no di ser de hatiye û derbas bûne!» Lê di dawîya dawîn de keçik biryara xwe dide ku biçe bavê xwe serwextî vê rewşê bike. Radibe diçe ba bavê xwe, li kêleka Wî rûdine û dibêje:

- Bavo ... Tu dizanî ku divê em ji nuha de biçin ji xwe re ardûyê zivistanê berhev bikin û bînin têxin hundur. Ma tu nizanî ku berf û baran, sar û serma ê di ser me de were?

Bi van gotinên keçikê re bav tevziyekê dikişîne, xwe ji hev vedikişîne û piştî du sê bawîşkan ziman lê digere û dibê:

72

- Ez dizanim keça min, ez dizanim ... ez dizanim lê ... lê tu li xwe binêre, biçe ji xwe re qurmik û sergînan berhev bike û bîne. Tu dev ji min berde, ez ... ez merivekî pîr im. Heta ku zivistan di ser me de were, ji xwe ez ê bimirim. Ji bo merivekî mirî, sar û germî wek hev in.

Keçik bi qasekî li ruyê bavê kal dinêre, mîna ku bavê wê neheqiyê mezîna lê kiri be, bi mirûzekî tirş û bêhêvî li wî ve-digerîne.

- Ê de baş e, bavo ... Ku dinê ji te re xweş be, ji min re jî bîst û şeş e. Ji xwe ez ê jî hatanî zivistanê ji xwe re mêrekî bikim û biçim ba wî. Ma ez ê ardû

çi bikim!? .. De qeyê ew teresbavê ku ez ê biçim mala wî, nuha ardûyê mala xwe jî daye ser hev!..

Herweha rojên germ û ron dibuhurin, hêdî hêdî ciyên xwe ji sermarojên zivistanê re dihêlên. Heta çelê zivistanê jî pîremêr her li bendî mirina xwe ye û keçik jî çav li mêrekî ye. Lê mixabin ... carina meriv di çîrokan de jî nagêhîje daxwaza dilê xwe. Zivistanek no di ser wan de tê, berfek xurt dipûkîne, diborizîne lê ne pîremêr dimire û ne jî keçik mêrekî bi ardû peyda dike. Herdu serî jî di wî xaniyê mezin û di paş deriyê kîpkirî de bêgav û bêdeng dimînin.

73

Weke hemû kesên vî navçeyî ew jî dixwaze xwe dîyar bike.

Dîyar bike ku ew êdî ne zarok e. Bi sal piçûk e, lê bi rastî jî xortekî bi destûpê ye. Êdî ew jî li dora xwe difikîne û di nava gund de boçê li xwe dixîne, çu di dest xwe de difirikîne ... Bi kurtî çu tiştên ku mêrekî giştî dike, ev xortê ha jî dixwaze bike.

Li ber siya dîwarê kuçekê gund, çav li pîremêrekî dixîne.

Pîremêr li ber siya dîwêr rûniştî, hêdîka cixara xwe dipifîne. Ji xort wetrê cixarekişandin daxuyakirin eke mêraniya ye. Ji ber vê yekê jî xort diçe ba pîremêr, silaveke mêranî lê hildide û li ber rûdine. Dilê xort gelekî dixwaze ku ew jî mîna pîremêr cixarekê di nava tiliyên xwe de dayne û çend pifên giran lê bixîne. Xort li ser pîyên xwe dizivire û ji pîremêr re dibêje:

- Xalo, tu cixarekêş î, ne wusa?

- Belê xwarzî.

Xort parîkî difikire û dûre careke din ji pîremêr dipirse: - Qutiya te hebû, ne wusa xalo?

- Belê xwarzî.

Pîremêr têdigihîje ku dilê xort dixwaze cixarekê bikêşe.

74

Loma giran giran destê xwe berdide bêrîka xwe, qutiya xwe derdixîne û dirêjî xort dike. Qutiya pîremêr jê re ji bavê wî de maye. Qutiyek kevn, mezin û derûdora wê zengalî ye. Xort vê qutiyê di destê xwe de dibe û tîne, lê tew têngêhîje ku ew ê çawa vebe. Dîsa dizivire ser pîremêr:

- Xalo, ma tu dikarî vê qutiya xwe vekî?

- Belê belê, çawa ...

Pîremêr qutiye ji destê xort digire, vedike û keremî wî dike. Xort qutiye ji destê pîremêr digire. Bêhna titûna mûşî davêje ser serçavê wî û gelek kêfa wî jê re tê. Lê vê carê di qutiye de pelê cixarê tune. Xort dîsa vedigere ser pîremêr û jê dipirse:

- Gelo pelên te jî hebûn, xalo?

- Belê xwarzî, ew jî hene.

Û pîremêr destê xwe davêje ber pişta xwe, destiyek pelên cixarê derdixe û dide destê xort. Xort hinek titûnê dixê ser pelekî cixarê, di nava tiliyên xwe de dibe û tîne. Pêçana cixarê, ji xort re dibe jihevderxistina tîpên Ouran'ê, çî dike nake, nikare bipêçe. Rehên şermezariyê li ruyê wî radibin, serê pozê wî xwîdan dide, lê ji bo kêşandina cixarekê wî ê çî bikira ... Xort xwe hinekî din jî ber bi pîremêr dike û dibêje:

- Xalo, tu dikarî ji min re cixarekî bipêçî?

- Erê, wey ...

Pîremêr qutî û pelê cixarê ji dest xort digire, hinek titûnê dide ser, carekê tenê di nava tiliyên xwe yê qermiçî de difirikîne, cixarekek mîna bol çêdike û keremî xort dike. Herweha, xort xwe êdî gihandiyê cixareyekê. Lê mixabin, ji bo vexistina cixareyekê, agirek jî pê re tune. Bi qasekî, bi vê cixara di destê xwe de dilîze û dûre dîsa bi serbilindiya rûşekî vedigere ser pîremêr û dibêje:

- Xalo, ez bawer dikim, agir ê jî bi te re hebe ... Pîremêr bi cîrek şêrîn berê xwe dide xort:

- Belê, belê. Agir jî bi min re heye.

Pîremêr vê carê destê xwe dixê bêrîka qutikê xwe, jê hinek paçpîşo û du perçên hesin derdixîne û heste jî dide xort. Xort bi rewşek nezanî li perçikên hesinan dinêre û bi çavan

75

wî paçpîşoyê di kefa destê xwe de dadiwerivîne; lê bi rastî jî tew tiştêkî ji wan demaxîne, cixara xort di nava levên wî yê tenik de dimîne. Zêde nabûhure xort ji bextreşî, heste jî dirêjî pîremêr dike û dibêje:

- Bi Xwedê xalo, ku te bikari bûya ev cixara jî vêxista ... Pîremêr di binê çavan re li xort dinêre. Heste ji destê wî digire, paçpişo dide hev, du sê caran perçên heste li hev dixîne û paçpişo vêdixe. Dûre cixarê ji nava lêvên xort derdixe, dixê nava lêvên xwe û cixarê vêdixe. Piştî ku hilmek dirêj ji cixarê dikêşîne, dizivire ser xort û dibêje:

- Belê, xorto!.. Ez dikarim bikêşim jî...

Dûmana ku ji dev û pozê pîremêr derdikeve, çavê xort her li peye.

76

MÎR Û XULAM

Her wextek Û her warek xwediyê mîr an jî mezinekî xwe ye. Ji bo ku çîrok ciyê xwe bigirê, serqisê em bibêjin Mîrê Mûşî û Mîrê Botî.

Rojekê Mîrê Botî dişîne pey Mîrê Mûşî ku Mîrê Mûşî keremî navçe û qesra wî bike. Li ser vê yekê Mîrê Mûşî radibe bi xulamê xwe î herî zîrek û baqil ve dikevîne rê û bi kêfxweşî ber bi Botan diçin.

Dema ev xwe digêhîne ber qesra Mîrê Botan, dinêre ku tevayiya şênîyên Botan hatine pêşîya wî ku xêrhatinê lê bikin. Çi mîrê malê û çi ew î ku bête vexwandin, di hevdîtîninê weha de mîrên herdu serîyan jî ji hev xweş dibin. Bi meziniyeke wusa, herdu mîr xwe digêhînin hev, diçin dest û ruyên hev, derbasî oda qesrê dibin, rûdinin û di warê navçeyên xwe de dikevîne galegalên dîrûdirêj.

Wexta xwarinê, textê nanê mîran bi çend babet xwarinên xweş tê xemilandin û mîr dest bi xwarina xwe dikin. Xulamê herdu mîran jî ji textê nanê mîran hinekî dîr, li ser pêyan di destirmanîya wan de sekinîne.

77

Di vê navberê de du libên biricê, bêhemdî bi simbêla Mîrê Botî ve dimîne, lê haya wî jê nîne. Xulamê wî viya dibîne û di dest de dixwaze bi awakî wusa mîrê xwe ji hebên birincê haydar bike ku mêvanên wan pê nehêsînin. Bi dengê xwe î nehênî, bala mêvanan jî dikêşîne û dibê:

- Mîrê min, du pezkûvî hatine dahlê.

Ji mêvanan kesek ji vê gotina xulamê malê fam nake. Lê dema ku Mîrê Botî hêdîka destê xwe davêje simbêla xwe û wan herdu libên birincê ji nav derdixe, Mîrê Miş û xulamê wî dibînin. Ev nehênîya di navbera Mîrê Botî û xulamê wî de, bi mêvanan tevgereke gelekî xweş û zana tê.

Herdu mîr li hev rûniştine û dîsa dest bi galegalên malmezinî û eşîrên xwe dikin. Piştî demeke kurt, Mîrê Botî dixwaze jîriya xulamê xwe pîşanî mêvanê xwe bide û ji xulamê xwe re dibê:

- Bêvankes, biçe ji me re qûfikek tiriye baş biqurêfe û zû bîne.

Bêvankes î xulamê Mîrê Botî:

- Li ser ser û herdu çavên min, mîrê min, dibêje û ji odê derdikeve.

Bi derketina Bêvankeso re Mîrê Botî wek karmendekî li ser radarê dest bi radariyê dike:

- Bêvankeso solên xwe xistin lingên xwe, ji hewşê derket û kete riya rezan, anuha xwe gihand ber perçîna rêz û kete nav ...

Di vê navberê de jî, Mîrê Miş û xulamê xwe herdu jî her bi mitûmatî guhdariya van gotinên Mîrê Botî dikin. Mîrê Botî didomîne:

- Bêvankeso tirî quraft, qûfik tije kir, hinek permêw jî dan ser devê qufikê, rahişt destê xwe û bi şûn de kete rê ... Bêvankeso xwe gihand hewşê, hat ber deriyê odê, solên xwe derxist û ... Ma tu hatî Bêvankes? dibêje û deriyê odê vedibe.

Mêvan dinêrin ku bi rastî jî Bêvankeso qûfikek tiriye nû-quraftî di dest de, kete hundur û tev qûfikê di fermana mîrê xwe de sekinî.

Mîr û xulamên Miş li hemberî van kerametên Mîrê Botî

78

Û xulamê wî devjihevî dimînin. Lê dengê xwe nakin û ~ekî nabêjin. Herweha wexta mêvandariya wan diqede, bi xatir û xêrûxweşî ji qesra Mîrê Botî derdikevin.

Di rê de Mîrê Mûşî her li ser van kerametên Mîrê Botî û xulamê wî dirame, diponije û dûre li xulamê xwe vedigere û dibê:

- Filankesê min, ma te ji xwe re dît bê xulamê xelkê bi çi kerametî ye. Bi nehênîyek herî piçûk jî ji hev fam dikin. Çi xulamekî baqil! Mîrê xwe ji qirêjê haydar dike û... û ji hêla din ve jî bi destsivikiya xwe serê mîrê xwe bilind dike. Bila nan li xelkê noşigiyan be!

Filankes î xulam li Mîrê xwe vedigerîne û dibê:

- Na na, Mîrê min. Ku biqewume, em jî ji wan ne kêmtir in.

Ev gotina xulêm, dikeve serê Mîrê Mûşî û pê mistek ava sar li ser dilê xwe direşîne.

Wextek dibuhure, Mîrê Mûşî xwe ji hertiştî re amade dike û dûre dişîne pey Mîrê Botî. Li ser vê yekê, Mîrê Botî radibe bi siwarî ew û xulamê xwe têne qesra Mîrê Mûşî. Piştî ku destên hev dileqînin û rewşa hev dipirsin, dûre bi pêlikên qesrê ve hildikişin jor û rûdinin.

Mîrê Mûşî jî ji mêvanên xwe re xwarinên xweş dide rastkirin. Lê beriya ku li ser xwarinê rûnin, Mîrê Mûşî derdikeve destavê, xulamê wî jî misîn digirê û dide pey mîrê xwe. Mîr li ser destavê gelekî difikire û diponije. Di dawiya dawîn de mîna ku tiştêk ji hev derxisti be, ji nişka ve banî xulamê xwe dike. Ev bankirina wî ewqas ji nişka ve dibe ku, ew bi xwe jî ji bîr dike ku li ser destavê ye. Xulamê wî bi rewşek xulamî diçe ser destava mîrê xwe û li ber disekine. Mîr jê re dibêje:

- Filankesê min, binêre ew roja ku te digot, va ye hat û li me sekinî. Ma nayê bîra te ku xulamê xelkê çiqas jîr û baqil bû! De îcar divê em jî tiştêkî wusa bikin ku bila devê wan jî li ber me jihev bimîne. Tu anuha baş guhdarî bike! Ku te çend libên birincê bi simbêla min ve dît, wê çaxê tu ê bibêjî: «Mîrê min eqwas gakûvî ketine dahlê,» Ji bo hanîna tirî jî, êdî tu û lingên xwe. Divê tu pir û pir zû biçî û binî. Me di nava xelkê

79

de rûreş dernexînî, ha!..

Xulamê Mîrê Mûşî:

- Bi ya Xwedê, em ê rûreş dernekevin, mîrê min. Ma çiyê me ji wan kêmtir e! dibêje û piştî destavê, Mîrê Mûşî û xulamê xwe didine pey hev û têne ba mêvanên xwe.

Herdu mîrên mezin li ber textê xwarinê rûniştine. Xulamên wan dîsa ji textê xwarinê hinekî dûr, li ser pêyan rawestine. Lê beriya ku mîr dest bi xwarina xwe bikin, Mîrê Mûşî di bin çavan re weha carekê li xulamê xwe dinêre. Ev nêhirina Wî mîna ku ji xulamê xwe re bibêje: «Hay ji xwe hebe, em ê nuha dest pê bikin,»

Di xwarina kevçiyê sisiyan de Mîrê Mûşî bi alîkariya tiliyên xwe, hinek birinc ji kevçiyê ber devê xwe dikute nava simbêla xwe û pê ve dizeliqîne. Di vê navberê de dikuxe ku mêvanên Wî jî bala xwe bidine Wî. Lê ji şeytanî re xulamê Wî wê peyvika «gakûvî» ji bîra dike. Xulam xwe diguvişîne, dêşîne, hişê xwe li serê xwe dicivîne, lê na, çi dike nake ev

peyvika bêyom nayê ser zimanê WÎ. Ji ber vê xwejbîriya xwe, hinekî jî sor dibe û şerm dike. Mîrê MÛŞÊ vê carê jî bi birinca ber pozê xwe ve li xulamê xwe dinêre û bi çend dengên nîvçe dikuxe ku xulamê WÎ zû wan tiştan bibêje. An ne hebên birincê, ew ê bi xwe ji simbêla WÎ de biketa. Mîrê MÛŞÎ vê carê bi gefxwarin li xulamê xwe dinêre. Xulam hay ji vê tengasiya mîrê xwe heye. Lê rebeno çî bike, peyvika ehmeq ne dihat bîra WÎ. Xulam dinêre ku rewş xirab e, loma radibe jî şermezarî hustuyê xwe jî hinekî xwar dike û dibê:

- Bibore ... li min bibore ku ew peyvika ehmeq nayê bîra min, mîrê min! Ew tiştê ku te li ser destavê ji min re got, ketine nava simbêla te. De îcar ne yek û ne jî dudu ne ... rasterast naxirek e!

Rengekî sor û zer xwe davêje ser ruyê Mîrê MÛŞÎ, û bi herdu destan wê naxirê ji nav simbêla xwe derdixe.

Heta ku nanxwarin diqede, ferûfol ji wir radibe û kahwe jî tê, Mîrê MÛŞÎ tew deng nake. Mîna ku ji tiştê enirî be, ketiye geliyên ramanê kwîr û her difikire. Dûre ji nişka ve banî xulamê xwe dike û wek ku li wextekê bihîsti bû, ew jî:

80

- Filankes! .. dibêje, biçê ji me re ji rez hagek tiriye paqij biçine û bîne!

Xulamê wî:

- Li ser serê min, mîrê min! dibêje û ji odê derdikeve. Piştî ku xulamê wî î Filankes ji hundur derdikeve, Mîrê

MÛŞÎ dest bi radarîstiyê dike û dibê:

- Filankeso bi lez solên xwe bi ser lingên we ve kirin, wusa bi lez e ku tew pê re ne gîhand benên wan jî bişidîne ... ji hewşê derket, bi lez û bez kete riya rezan û çû, xwe gîhand ber perçîna rêz û xwe di ser re havête nav. Filankeso haga xwe tije tiriye mîna şûşe kir û şivemêw dan ser ... haga xwe hilgirt û bi şûnde vegebiya. Rê bi tozûtewar e, ez ditirsim li ser tirî bi-veniştê, Filankeso xwe gîhand ber malan ... hewşa qesrê hil-

kişiya jor, hat ber deriyê odê û hag ji ser milê xwe danî .

Mîrê Mûşî li vir, li hafa mêvanên xwe destê xwe jî ber bi deriyê odê bilind dike, bi dengekî berz û qure dibêje:

- Filankeso, tu çûy û hatî, ne wusa?

Derî vedibe, Filankes î xulam xwe li ber derî xwar kiriye û di vê rewşa xwe ya xwarbûyî de li mîrê xwe vedigerîne û dibê: - Na welle, mîrê min. Ez hîna li fera sola xwe digirim. Ma tu nizanî ka fera sola min li kuderê ye?

81

Lt tZiNGtN MiN

Xortekî êzing li kerê xwe bar kiriye û ji bo firotinê ketiye riya bajêr. Bi banga dikan re ji xew rabûye û li pey kerê xwe serxew serxew dihênije û bêdeng diçe. Hîna riya wî dûr e. Hevalek jî tune ku bi peyv û şor rêwîtiya xwe bike. Histêrik li asîmên diçirûskin û dengê pixîna lawirên çolê têne guhên wî.

Gelek derbas nabe, dibîne ku rêwîyekî rîsipî li pêş wî diçe. Xort xwe digêhîne rîsipî, silavê li hev dikan, rêwîtiya hev dipirsin û bi galegal riya xwe didomînin. Ji vir û wir dipeyivin, qala gundî û karên wan, meriv û çêbûna wan, Xwedê û karê wî yê nexşîn, pêxember û ilmê wî, heywan, dar, asîman, histêrik ... û li ser gelek tiştên din dipeyivin. Peyvên wan diqedin lê riya wan hîna maye.

Rîsipî gelekî westiyaye, çavê wî ji rê tirsiyaye û çogên wî şikestine ... Dizane ku xort barê xwe yê êzingan ji bo firotinê dibe bajêr. Loma vedigere ser xort û jê re dibêje:

- Xorto, ma tu ê bikari bî vî barê xwe bi çiqasî bifiroşî?

- Wele nizanim ... U min hertim bi deh qurişan difiro.

- Baş e. Ku buhayê barê te çî be, ez li vir bidime te, tu

82

barê xwe li vir biqelibîne, ez heta bajêr li kerê te siwar bim. Bi Xwedê ez gelekî westiyame.

Xort berê:

- B3ş e, dibêje. U hinekî dirame û dûre dipirse:

- U êzingê min?

- Êzingê te, mîna ku te biri be bajêr û li wir firoti be.

Xort dikeve nava ramanên kwîr û heta gavekî ji bîr jî dike.

Lê rîsipî hîna li bendî bersîva xwe ye. Piştî rêveçûnek kêr, ji westê hêle di rîsipî de namîne û car din vedigere ser xort û dipirse:

- De ... ka te tişte ne got, xorto?

- Ez çi bibêjim, xalo?

- Tu kerê xwe nadî min, ez lê siwar bim?

- Ê ... ma barê min li ser e.

- Min ji te re got, ez ê perê te li vir bidime te ... Ma tu ê her êzingên xwe nefiroşî? - Belê.

- Tu ê bi çiqasî bifroşî?

- Ez bawer im ku ez ê bi deh qurişan bifroşim.

- B3ş e, ez ê li vir wan deh qurişên te bidim te, ez ê barê te li vir biqelibînim û ez ê ji xwe re heta bajêr li kerê te siwar bim. A fermo ji te re perê te jî ...

Bi van gotinên xwe re rîsipî dest davêje paşila xwe kêsekî çermîn derdixe, destê xwe tê de dike û ber bi xort dirêj dike.

U xort dîsa dibê:

- B3ş e, lê êzingên min?

Rîsipî ji nû ve dest pê dike û ji xort re dibê:

- Xorto, tu çima serhişkiyê dibî? Te got, ez ê vî barê xwe bibim bajêr û bifroşim, ne wusa?

-Erê ...

- Êê .. baş e, ku ez nuha perê barê te bidim te, ma ew ê ce-waziyekji bo te hebe? -Na.

- De ... wê çaxê barê xwe biqelibîne, ez ê deh qurişê te bidime te û ji xwe re li kerê siwar bim.

Mîna ku serê xort zelal bû be, xwe zûzûka digêhîne ber

83

kerê ku barê êzingan biqelibîne. Lê ji nişka ve li xwe divarqile ku barê êzingên wî ê li wir bimîne. Tawilê dest lê sist dibin, xwe bi şûn de vedikişîne û vedigere ser rîsipî:

- Ê ... lê êzingên min, xalo? Ma êzingên min ê li vir bimî-

• I?

nIn

Wexta bêderan e. Hemî gundî li ser bêderên xwe ne, ka-rûbarên xwe dikin. Di vê germa havînê de; gundiyên ku li pey ga holê dikin, yên ku li ser moşinê di bêderê de dizivirin, yên ku bêr û milêv di dest de bêderên xwe didin hev û ji hev safî dikin ... Xuştîna wan e dixebitîn û mîna ku di hêtûnekê de bin, xwîdanê di ser wan re qelibandiye.

Gundiyên belengaz ji bo birçînebûyinê, ji bo rojên teng û zivistana sar û şil wek mîroyan dixebitin.

Piştî ewqas keda wan, berhema wan xwe bi bayekî payizê re dinimîne. Bi vî bayî re zad xwe ji kayê dide alî û ruyê gundiyan bi xwe dipişirîne, Lê heta ku gundî vê berhemê dibîne; dest li xwe diperitînin, dev û livên xwe li xwe diqelişînin, ser û çav li xwe diqermeçînin, jiyana xwe ya salekê li ser dibuhurîDID.

Û hinek kes jî bê ked û bê qotik debara xwe ji van gundiyên reben derdixînin. Bi xuyakirina genimê sor re; şêx, mele, seyda, feqî, parsek, qereçî, zirt... Lê tew alimên olê!.. Hevalê pêxember, kurê Xwedê ... Her yek ji hêlekê ve dirêjî ser bêde-

ran dike. Bi kod, elb, qinyat, bêjing û têrên xwe têne ser bêderan ... Qamçûr, para Xwedê, zikat, pars û geştên xwe didin hev û diçin. Herweha pergela gundiyên mihêr dîsa dikeve rewşek xirab. Lê çî bikin!..

Feqîyek, di dest de tizbiyek nodûnehîn, di bin binçegê wî de jî têrek mûyîn û ber bi bêdera gundiyeke diçe. Gundî, bi kêfxweşiya berhema sala wê salê, li dor bêdera xwe diçe û tê. Haya wî ji feqî tune. Lê dema ku çav li feqî û têra di dest de dixîne, dewsa kêfxweşiyê pêşmala bextreşiyê digire ser rûçikên wî û gwîn lê divemire. Têra di binçengê feqî de têra Xwedê bûya jî, dagirtina wê ê bi gundî çetin bihata. Lewra wî bi xwe jî, hîna ji vê berhema xwe ya nû, misteke zad ne kişandiye û ne xistiye kewara xwe.

Feqî di pey silav û gotina xwe ya «Xwedê zêdetir bike» devê têra xwe vedike, dide ber kêla genimê sor û dibê:

- Ez hatime para Xwedê.

Gundî dike ku bibêje: «Ez jehrê didim!» Lê feqî, Xwedê xistiye navbera xwe û wî. Gundî hinekî li ser dirame û dûre xwe bi xwe dibê: «Wele ez dizanim ev ne para Xwedê ye. Li ser navê Xwedê, ji xwe re berhev dike. Ma ew kezebşewutiyê Xwedê ye!? .. an pir berketiyê Xwedê ye!? .. » Gundiyê xwediyê bêderê xirab difikire, dike ku li feqî bixe. Milêva wî di dest de, li kêla genimê xwe î sor dinêre, li dorê diçe û tê. Feqî jî, devê têrê daye ber kêla genim û li bendî dagirtina gundî ye. Hêrsa gundî hatiye ber qirika wî, tûj û tije bûye, xwe nagirê û bi dengekî nizm dibê:

- Welle, şeytan dibê vê milêva xwe rake û di serê wî de çik bike!..

Lê feqî tavilê têkilî qisedana wî dibe û dibêje:

- Na, na ... ez di bextê te û Xwedê de ... tu nebî nebî bi gura şeytên bikî, ha! Ma meriv bi ya wî dike!...

Herweha feqî serê xwe ji milêva gundî diparêze. Lê hîn jî li ber kêla genim, devê têra xwe vekiriye û li bendî dagirtina gundî ye. Gundî hêdî hêdî serê xwe ji ber xwe radike, li nava çavên feqî dinêre û vê carê jî bi dengekî bilind dibê:

- Welle, şeytan dibê têra feqî bide ber kêla genim û jê re

86

bi ser tije bike û bibêje, de fermo!

Dema ku feqî van gotinan ji devê gundî dibihîse, gelekî dilşad dibe. Herçend şeytên ev gotina bi gundî dabûya kirin jî, dîsa li peşka feqî dihat. Li ser vê yekê, feqî bi rewşek giramgîr û bi dengekî nizm di ber xwe de dibê:

- WeUe ... ku meriv carina bi gotina şeytên jî bike, baş e ...

Lewra di ola me de ...

87

GA

Merivekî bi navê Ga heye. Ne hûn bipirsin û ne jî em dikarin bersivê bidin. Lewra ev meriv, ango Ga, bi xwe jî nizane ku ev navê ha ji kengî de bi dû ketiye, an kê ev navê Ga lê kiriye. Bixwesta jî û nexwesta jî; heta roja îroyîn xelk bi navê Ga banî wî dike û hîna jî wî wusa bi nav dikin. Êdî jina wî û zarokên wî jî ... Ku meriv ji law, an jî ji keça wî bipirse ka zarokên kê ne, ew ê tavilê bibêje: Ez kur an jî keça Ga me. Na na, ew şerm nakin.

Lewra navê bavê wan î rastî Ga ye û mêrik bi xwe jî dizane ew bi vî navî ye.

Ya rastî ev merivê ha li ber deriyên xwedî bûye. Bi nanzikî karûbarên xelkê kiriye. Dibe ku ev navê Ga bi vî awayî bi dû wî keti be. Salek, dudu, sisê gelek sal bi vî navî buhuriye û êdî nikare xwe jê jî bişo. Ji xwe çîrok jî eve. Ango mêrik dixwaze xwe ji vî navî pak bike. Lewra wî êdî pez hene, dewar hene, erd û rez hene ... bi kurtî rewşa wî guheriye û bûye dewlemendekî mezin. Lê navê wî piçekî jî ne guheriye. Ji kal û pîran heta zarokan, xelk hemî jî hîna bi vî navî banî wî dikan. Serqisê: Dibêjin; hevalê Ga, apê Ga, xalê Ga, kirîvê Ga, cîranê

88

Ga ... herweha tê gotin û di nava xelkê de hîn didome.

Rojekê mêrik gelekî dirame û xwe bi xwe dibêje: «Gelo meriv nikare vî navê min biguherîne? Banî hemû xelkê bikim, bi şîv û şorbeyekê, bi mewlûdekê ... divê ez wan serwext bikim ku ji bo min êdî navekî din divêt.» Piştî van ramanên xwe dixwaze bi jina xwe jî bişêwire ka ew çî dibêje.

Şevê argûnên xwe dadidin, ew û jinikê bi tena serê xwe li ber agirê xwe rûdin, mîna girtina biryarên tiştên girîng, li ser vî mijarê jî bi dengê nizm û giran dipeyivin. Li derekê mêrik ji kewaniya xwe re weha dibêje:

- Binêre, jinik. Êdî ez dewlemend im. Salên min derbas bûne û ez li ser rîya mirinê me. Li vî dinêya derewîn, heta roja îroyîn jî xelkê bi vî navê Ga banî min kir. Lê ez naxwazim ku sibê jî xelk li pey min bibêjin: Gayê rihmetî merivekî çê an xirab bû ... Ez naxwazim ku bi vî navî biçime hafaX wedê. Îcar ez dibêjim, tu were em vî navê min biguherînin. Diyîna navekî xweş jî li ser te. Divê tu navekî xweş ji min re bibînî.

Mêrik û jina xwe dûrûdirêj diramin, herdu serî jî bêdeng dimînin, agirê di argûnê wan de ditefe, lê ew hîn jî di geliyên ramanên kwîr de ne. Di xeyalên xwe de, mêrik ji xwe re li navên mîr û malmezinan digere. Lê mîna ku jina wî ji xeweke giran şiyar bibe, ji nişka ve berê xwe bi mêrê xwe de dike, bi dengê nîvçe û tevlihev dibêje:

- Min dît, min dît!.. min navek ji te re dît.

Mêrik gelek kêfxweş dibe ku ew ê navê wî bête guhertin.

Wek jina wî, xelk ê jîji vir û weha bi navê wî yê nû banî wî bikin. Mîna ku mêrik nû ji diya xwe bû be, ewqas dilşa dibe. Ji dilxweşiyê di cî de nahewe ku jina wî, jê re navê wî yê nû bi lêv bike. Bi hêviyek bêpîvan li bendî livîna lêvên jina xwe ye ku bibihîse ka jina wî jê re çî nav peyda kiriye. Jina wî, mîna ku tiştêkî dûrî aqilan dîti be, bi payedariya lêkolînerêkê dibê:

- De ... ku tu dixwazî bila navê te bête guhertin, wê çaxê bila ... bila Ker be. Navekî xirab nine.

Lê dema ku mêrik vî navî ji devê jina xwe dibihîse, mîna ku kunek ava sar di ser de hati be rijandin, sipûsar û qidûmşikestî dibe. Di pey vê yekê re, helala wî ya ewqas sal li ber ça-

89

vên wî reş dibe û dilê wî jê li hev dikeve. Êdî serê wî zelal dibe ku ev navê wî nayête guhertin. Ku were guhertin jî, ew ê ji navê wî yê Ga ne çêtir be. Loma bi rewşek bêhêvî li jina xwe vedigerîne û dibê:

- Welle, jinik ... ku ez bizani bim ez ê bi vî navê xwe î nû jî ji axo dernekevim, wê çaxê bila navê min î kevn li min bimîne, gelek û gelek çêtir e.

90

COLEKGUR

Ji çîyan de merivek dadikeve xwarê. Hilkehilka wî ye û xwîdanê di ser re qelibandiye. Meriv nizane ku ev bazdana wî ji tirsê ye, an ji kêfê ye. Nêzîkayî li gund kiriye. Ji bazdanê şalê wî bi dar û keleman ketiye, rizîyaye û pertolî bûye. Şekalên di lingan de, ji berg û keviran pozik pê ve ne mane. Rîtalên şalê wî ba girtine û dileqin. Heta P3ş malên gund jî rewşa wî her wusa ye.

Gundiyên ku li bin siya dîwarê mizgeftê rûniştine, hemî jî lê ecêmayî bûne. Dilopên xwîdana eniya wî, xwe hêdî hêdî berdidin ser gupên wî û li wir sar dibin. Ji civata ber mizgeftê rîsîpiyek bi liveke dilşewat jê dipirse û dibêje:

-Ev çî... çî teba ye? Çî li te qewumiye?

Mêrik dixwaze ku zûzûka bersivê bide, lê ji bêhnvêdanê hîn jî nikare xwe serast bike û çîroka xwe ji wan re bibêje. Ev rewşa wî, civata li ber dîwêr bêtir diheyirîne. Hemî jî lê matmayî bûne û di serê xwe de tiştina çêdikin.

«Gelo neyaran dabûn pey? Aya xezebek wusa giran hatiye sêrê Wl"? ••
» Herweha serê hemûyan jî bi Îşarên pirsê tijî bûne. Lê piştî qasekî bêhn
91

tê ber, ziman dikeve dêv û ji civatê re dibêje:

- Gundîno! Bi navê Xwedê îro colek gur rastê min hat.

Colekî wusa ku ...

Ji civatê hinek dipişirin û hinek jî ji bo ku nekenin, di zimanên xwe de gez
dikin. Lewra ku mêrik kenên wan bibihisiya ew ê ber xwe biketa. Civat
him guhdariya wî dike û him jî di binê çavan re li hevdu dinêrin. Yê rîsipî
dîsa mezinayiya xwe di civatê de rayê dide û dibê:

- Kurê min, tu xerifiye, çi ye? Ma tew colek gur bi hev re digerin!?.

Mîna ku mêrik parîkî şerm kiri be, serê xwe dixê ber xwe û dibêje:

- Erê welle, apo!.. ku colek nebe jî, heştê heb hebûn. Ma ez derewan
dikim!?

Civat bi dijwarî kenê xwe disekinîne. Rîsipî serê xwe bi manedarî dihejîne
û dibêje:

- Na, na ... lawê min. Nabe, heştê gur jî bi hev re nagerin.

- Bi navê pêxember, apo!... ma min tu carî derew kiriye?

Heştê nebûya jî, şêst heb hebûn.

Li ser vê yekê, yekî din jî ji civatê dengê xwe bilind dike û dibêje:

- Lo de rabe ser xwe tu jî! Ma tu kesekî şêst gur bi hev re dîtîye!?.

Civatê hefsar li kenê xwe berdaye êdî. Mêrik hinekî din jî ji hejmarên xwe
tê xwarê û dibêje:

- Ê ... bi Qurana Mihemed, lo!... Ma we kê dîtîye ku min derew kiriye? Ez
wek navê xwe dizanim ku ... ku şêst nebe jî, çel heb rihet rihet hebûn.

Pêkenîn ji civatê re peyda bûye carekê. Ne ew vê hejmarê dipejirînin û
ne jî mêrik dev ji gurdîyîna xwe berdide. Rîsipî car devê xwe vedike û bi
hêrs ji mêrik re dibêje:

- Lawo de hiş be! Tu ji navê Xwedê hetanî navê pêxember û Quranê hatî
xwarê. Tu ê naha me jî bikî kafir û berdî gidîl .. Ev çi ye!.. Em dizanin ku tu
derewan nakî, lê ... lê ewqas gur jî bi hev re nagerin!

Mêrik ji van gotinên rîsipî bêtir şerm dike. Lê xuyaye ku

92

êdî nikare dev ji dîyîna xwe ya guran jî berde. Xwe bi xwe di-fikire û «Bi kêmanî ez van hejmaran daxim» dibêje û mîna ku dev ji çend serî gurên xwe berda be, dîsa dibêje:

- B3ş e apo, baş e ... Bi serê min û we, ku çel tune bûya jî bîst lib hebûn. Ma ez ê çima derewan bikim?.

Civatê jê bawer ne dikir. Li hêlekê tobetobe ya kal û rîsipîyan e û li hêlekê jî biqebiqên xortan e, dikenin. Ev kenê ha êdî ne ji bo dîyîna wî ya guran e, lê ji bo vê rewşa wî ya ku ew anuha tê de ye. Bêdengiyek kurt digirê ser civatê. Baş xuyaye ku mêrik di ramanên xwe de li hinek tiştan digere ku pê civatê serwext bike, an jî serê wan zelal bike. Lê ji hêlekê ve jî dixwaze navê guran ji bîr bike û tew çêlî vê mijarê neke. Mixabin, ji civatê xortek radibe û dîsa dibêje:

- Bavikê min ... havîn e. Ez tew jî bawer nakim ku di germ û ronahiyê de bîst gur jî bi hev re bigerin. Ma tew kes rastî tişteki weha hatiye?!..

Mêrik hinekî jî bi hêrs li xwediyê vî dengê dawîn vedigere û dibê:

- Tu firqûziyê meke!.. Ev hemî gundê ha jî dizanin ku ez derewan nakim. Tiştê ku ez dizanim, ne bîst be jî deh gur hebûn.

Tev wî xortê firqûz, ken û niçeniç bi civatê dikeve û di binê çavan re li hev dinêrin. Mêrik ji serê Xwedê heta serê xwe, ji colek gur heta hejmara bîsta daketiye. Lê ji bo ku gurdîyîna xwe bide pejirandin, hîn jî ber xwe dide, mîna canbazekî: Evqas ne, ewqas ... dibêje û dîsa di bin xwîdanê de maye. Lê ev xwîdana wî ne ji tirsê û ne jî ji westanê ye êdî. Şermezariyê dora wî girtiye. Mîna ku wî gurdîyîna xwe kiri be rik û yên li dorê jî ji tinaz û kenên xwe namînin. Mêrik dît ne dît, hejmara gurên xwe dadixîne pênc, çar, dudu ... yek, û herweha her ku ew ji hejmara guran dadikeve xwarê; kenên civata li ber siya dîwarê mizgeftê jî ewqas bilind dibe. ReWş dişêhije dereke wusa ku, hemî gundî hatine temaşa wî û civatê. Edî tu hejmar ne mane ku jê dakeve xwarê.

Mêrik carekê li xwe divarqile, serê xwe radike ku çî bibîne!.. Ji zarokan bigire heta pîran û ji keçan heta xortan, hemî

93

lê civiyane. Gelek poşman dibe, difikire, diponije û di dilê xwe de dibêje: «Xwezîka min ev tişt ne goti bûya» Ji bo daketinê herçiqaş hejmara guran

ne ma bin jî; ne gengaz e ku jara wî, rûreşiyeye weha bihewîne. Li ser vê yekê, mêrik li dora xwe dinêre, car din bala civatê dikişîne ser xwe û dibêje:

- Ê ... baş e, Ez dizanim ku Xwedê ji derewan hez nake.

Lê ku ew ne gur bûyana; de ka ez ji we bipirsim wê çaxê ... lê ew çi xişexiş bû ji wan derina dihat?

94

HEFT KÎR HEŞTt HELANDÎ

Navê wî wek «Paşa» tê gotin. Bi xwe jî, li vî navçeyî xwedî kanebûneke zêde ye. Zordariya wî li vî navçeyî nav û deng daye. Ku bixwaze merivan serjêdike, wan bi darde dike, jinan ji mêrên wan dide berdan û dikare bide hinekên din ... dîsa jî tu kesek newêre jê re bibêje: «Tu baş dikî, Paşa».

Ji hêla din ve jî, mîna dewletekê kar dide ber xelkên vî navçeyî. Wan dixebitîne, bêjê ji wan digire û li gor xwe gelek tiştan bi wan dide kirin. Dibêjin, gundekî ji hêla ehmeqiya xwe ve dengdayî jî li vî navçeyî, di bin fermana vî Paşayî de ye.

Mîna gundiyên din, Paşa rojê heşt saet karkirin û ji bo wextekê jî heft lîtir rûnê nivîşkê wek hoy dide ber xelkên vî gundî jî. Dema ku gundiyên vî gundê ehmeq diçin kar, di veşerê de berê wan dikeve royê û tîrêjên roya li ber ava, li nava çavên wan dixîne. Ji ber vê yekê nikarin pêşiya xwe bibînin û herweha ev vegera wan ya malê gelekî bi dijwarî dibe.

Gundî li hev dicivin, li ser dijwariyên van tîrêjên royê di-peyivin, bi hev dişêwirin û dûre di nav xwe de biryarekê distî-

95

nin da ku giliyê royê bi P3şê de bikin. Ji wan yekî herî baqil dide rê û diçe van daxwazên hevalên xwe, ji P3şê re dibêje. Dema xwe digîhîne hafa P3şê, patekê davêje û dibêje:

- Paşayê bi hêz ... Dema ku em diçin di zeviyên te de kar dikin, çavên royê bar nabe. Di hatina me ya malê de, mîna ku qest û qereza wê bi te re hebe, tîrêjên xwe berdide hundurê roniya çavên me. Ê em êdî nikarin bi asanî werin mala xwe. Bi Xwedê, ez bi navê hemî gundiyan hatime ji te

tika bikim ku tu tişteki ji vê roya bêbext re bibêji û me ji xezeba wê bifilitîni.

Paşa li çi digere! Ev ehmaqiya wan ji P3şê re dibe weke bêdereke libakiri. Paşa parîki difikire û dûre lê dizivire:

- Kanîbûna bi royê gelekî dijwar e. Lê, bi şertekî ez ê dîsa xwe biceribînim. Divê hûn jî wê çaxê ji dêla ve heşt saetan, neh saetan kar bikin û ji dêla ve heft lîtir rûnê nivişkê jî, divê hûn heşt lîtir rûnê helandî bidine min.

Baqilê ku li ser navê hevalên xwe hatiye, bi kêf dizivire ba gundiyan û rewşê ji wan re kat dike. Sibetirê gundî dîsa radibin û diçin ser zeviyan. Li gor şertê P3şê êdî neh saetan kar dikin.

Kêfa gundiyan li cî ye û kar dikin. Piştî karkirina neh saetan, ji xwe êdî ro jî diçe ava. Dema ku gundî neh saetên xwe diqedînin, piştî xwe rast dikin û dest ji kar berdidin, xwe tev dikin û berê xwe didin gundê xwe. Di rê de dijiwariya tîrêjên royê dikeve bîra wan. Serê xwe radikin li asimên dinêrin. Ne ew tîrêjên ku her roj xwe berdidan hundurê roniya çavên wan û ne jî ro xuya dike. Li gor wan an jî ji wan wetrê, ro û tîrêjên xwe ji gefên P3şê tirsîyane û wenda bûne. Çendek ji wan:

- De binêrin ha, ro jî ji Paşayê me tirsîya.

- Ma em nizanin ku navê Paşayê me ji bo çi derketiye.

- Ma min ji we re ne goti bû, hêza Paşa yê me bêguman e?

Herweha herkes dîtînin xwe yê li ser P3şê dibêjin. Yek jî ji nav wan derdikeve û dibê:

- Ma... lê me jî heftê nivişkê nekira heştê helandî, Paşa ê ev fedekariya bikira? Ez tew jî ne bawer im.

96

JiNIKEK Û BÛKÊN wt

Jinikek xwediyê heft zik zarok hebû. Di her zikî de jî Xwedê li ruyê wê meyizî bû û law dabûyê. Lê kêmasiya tişteki dîyar bû. Hemû karûbarên malê di hustuyê jinikê de bû. Lawên jinikê hemî jî mezin, êdî bû bûn xort. Rojekê zewacên hemî kurên wê xelas bû bûn, heft bûkên wê yê rengoreng di hewşa mala wê de li karkirinê bûn. Kêfa jinikê li cî bû. Pêjnên xwediyê heft kur û heft bûkan, dilê wê şa kiri bû. Ji wê wetrê ew ê êdî ne

kêmasiya wê bibûya û ne jî kul û keserek wê ê çêbibûya, çerxa mala wê ê ji ya felekê xweştir bigeriya. Ji derve de jî wusa dixuya, lê na.

Ji ber ku her bûkek wê jî ji dê û bavekî bû. Her dê û bavek ji gundekî bû. Û her gundek ji navçeyekî bû ... Bejnûbalên bûkan jî ne wek hev bûn. Serhişk bûn, di kirina karekî de bi hev ne dişêwirin û ji hev xwî dikirin.

Jinik ji van livên bûkên xwe nerihet dibû û pê dinepixî.

Êdî nikari bû peyvên xwe jî bi wan bide guhdarkirin newêrî bû cirên wan ji lawên xwe re jî bigota. Lewra ne dûrî aqilan bû ku lawan ji bo jinên xwe pevçûn derxista û bi hev ketana.

97

Ev tirsî di dilê jinikê de wek kwînêrekê dor li xwe girêda, hilda ... roj, meh, sal ... buhurîn.

Ji rojan rojekê beroşa gêrmîyê li ser êrgûn e. Heft bûk jî di karûbarên malê de mijûl in. Ji wan yek, di ber beroşê re derbas dibe, dimeyize ku agirê binê beroşê temiriye, tîne du dar hejik davêje binê beroşê û çengek xwê jî davêje nav gêrmîyê. Ya din ji avê tê, hinek PÛŞ davêje binê beroşê, PÛL dikeyê û ew jî tîne mistek xwê davêje beroşê. Ji bûkan yeke din ji rastkirina dewaran tê, dinêre ku agirê binê beroşê li xelasiyê ye. Ew jî bi lez agir li binê beroşê şên dike û tîne ew jî çengek xwê davêje beroşê, Yek din dinêre ku bêhna kizûriyê tê, xwe zûzûka digêhîne beroşê, li hev dixê û ew jî mistek xwê davêje beroşê ... Herweha hemî jî vatiniya bûktiya xwe tîne cî. Bêyî ku biçêjin hemiyar jî, çengek xwiya xwe havêtine beroşê, Di wextên bûkaniya xwe de heta naha, tew rojekê jî weke vê rojê wusa şek û jêhatî ne bûne. Di vê rojê de hemiyar jî, mîna mîroyan kar kirine. Bila kerametên van heft bûkên karkir li vir bimîne, em vegerin ser xesûya heft bûkan.

Xesû dinêre ku her heft bûkên wê jî di karûbarên xwe de mijûl in, bi kêfxweşî xwe bi xwe: «Bi kêmanî ez li ar û xwiya beroşa gêrmîyê binêrim» dibêje û ber bi beroşê diçe.

Bilqîna beroşê xwe ragirtiye û gêrmî gelekî XWeş dixuye.

Jinik bi xwe ecêbmayî dimîne ku van bûkên wê di ber van karên xwe yê din re ev beroşa gêrmîyê bê pitepit û kêmasî kelandine. Jinik pê kêfxweş jî dibe ku bûkên wê êdî têne ba hev, bi hev dişêwirin û bi hev re kar dikin.

Xesû du sê caran heskê li nav gêrmîyê dixîne û tev dide.

Dûre hinekî dixê ser pozê heskê û diçêje. Lê dema jinik heskê dibe ber devê xwe û zimanê xwe pê dixê; lêvên qermeçî bêtir lê diqermeçin, mirûz lê tirş dibe û heskê hêdîka di nava beroşa gêrmîyê de datîne. Mîna ku dan di sûravê de hati be kelandin wusa şor e. Gêrmî qet bi kêrî xwarinê nayê. Jinik têdigêhîje ku dîsa şewra bûkan bi hev ne bûye. Kî raserî beroşê hatiye, an beroş ketiye bîra kîjanê, hema rabûye mistek xwê havêtiye nav.

Ew jî hema bê deng û bê pirs radihêje şekala xwe û davêje

98

nava beroşa gêrmîyê. Dûre dadide heskê û hêdî hêdî tev dide. Dema bûkên wê yên ku vê liva xesûya xwe dibînin, tên di ser beroşê re radiwestin. Heya ku hemî bûkên wê pê dihesin û tên lê dicivin jî, jinik her beroşê tev dide. Di ser beroşê re devê hemî bûkan jihevî, sipûsar li heska xesûya xwe dinêrm.

99

KERENGABERBT

Du merivên gundî bi hev re dibin heval û berê xwe didin warên biyanî. Bi her awayî bext didin hev ku li xeribiyê pişte-vaniya hevdu bikin û ji hevdu re bibin alîkar. Lewra jiyana biyanî bi merivan ve ne xuyaye. Birçîtî, bêkestî, tenêtî û gelek tiştên ku nayê bîra meriv, ne dûrî aqilan e ku bi serê meriv de bê. Loma! Loma di rêwîtiyên weha dûr de ji bo meriv dost û nasên jidil pêwîst e.

Piştî rêwîtiyek dûrûdirêj, herdu hevalên jidil xwe gihandine cî û warên xerîb, bi hev re kar kirine, serûsiya wan li hev bûne, rojên teng û fere dîtine û herweha ji mal û zarokên xwe dûr, gelek wext jî bi hev re buhurandine.

Anuha jî di rê de ne û êdî vedigerin mala xwe, nava zarokên xwe. Lê divê meriv rastiyeke çîroka wan jî ji bîr neke ku di jiyana biyanîtiyê de, ji hogiran yekî, her kar kiri bû û ji bona zarokên xwe pere dabû ser hev. Lê ew î din, hew xebitî bû û xwari bû, geriya bû û pê kêfa xwe kiri bû. Ji ber vê yekê jî anuha destvala vedigeriya mala xwe.

Herçiqas ev yeka ha pê dijwar jî, dihat lê bi hevalê xwe ne

dida xuyakirin. Hevalê wî di vê veжерê de jê re dibêje:

- Heval, ku tu divê ez hinek peran bidime te, da ku tu jî bi destên vala neçî ba zarokên xwe. Ma ew ê neyên pêşiya te, û tiştekî ji te nexwazin!? ..

Lê hevalê wî li xwe nagirê û her dibêje: -Na

Ev herdu heval gihîştine navçeyê xwe, lê riya gundê wan hîna bi qasî sê saetan maye. Loma anuha li ber qûçekê rûniştine û nanê xwe dixwin. Bayekî payîzî li PÛş û palaxa hawirdor dixwe, mîna dayikek ku di ser dergûşa xwe de bilorîne dengên xemgîn têne bihîstin. Bi vî xweşdengê hawirdor re, xweş xuyeye ku mal û zarok li ber çavên herdu hevalan jî digerin. Lê li vir, li ser nanê çolê bêbextî dikeve dilê hevalê bêpere û ji hevalê xwe re dibêje:

- Ez ê te bikujim û hemî perên ku bi te re hene, ez ê bistîmm.

Hevalê wî pêşiyê bi rewşek matmayî li ruyê hevalê xwe î biyanîtiyê dinêre, ew hemî demên ku bi hev re buhurandine di ber çavên wî re zûzûka derbas dibin, di dilê xwe de xurtbûna hevalê xwe dipîve û wê çaxê ramana bêbextiyekê diniquete dilê wî. Loma bi hustuxwarî ber hevalê xwe digere, xwe bi xwînekî davêje bextê wî û jê re dibêje:

- Heval ku te peran divê, ez bidime te, lê ji bona Xwedê tu vê bêbextiyê neke!

Mixabin, carekê çav li hevalê wî sor bûne û bêbextî ketiye dilê wî. Dixwaze hemî perên hevalê xwe bistîne. Hevalê xwe-dîpere dîsa xwe davêje dest û lingên hevalê xwe û jê re dibê:

- Heval ku tu bivê, em van perên ku bi min re ne, li hev par bikin. An ku tu bixwazî ez dikarim hemûçkan jî bidime te. Lê bes tu vê çavsoriyê li min neke!..

Carekê kevir ketiye ber dilê hevalê wî û dilovaniyê nake karê xwe. Xençer di destan de û wek yekî har li dora hevalê xwe zîz dibe. Yê reben êdî baş têdigêhîje ku hebûna perên wî bûye xezeba serê wî. Bala xwe dide qûçê û ji hevalê xwe î bêbext re dibê:

- Heval, ku tu min bikujî jî, tu nebêje qeyê ew ê ji te re bi-

mîne, an kesek ê pê nizani be. Rojekê ew ê ev kevirên qûçê, ev tayê kerenga ha jî dîdevaniyê li te bike ku te ji bo perê dinê hevalê xwe kuştiye, Herçiqas rebeno dikir ku bi van gotinên xwe dilê hevalê xwe nerm bike û ji bêbextiyek reş bifilite, lê pê re nagêhîne. Hevalê wî xençera bêbextiyê li ser dilê wî dixê û reben li ser kevirên qûçê, li ber tayê kerengê dirêjî erdê dibe.

Hevalê bêbext di pey kuştina hevalê xwe re hemî perên wî ji ber piştta wî derdixîne, laşê wî dikêşe newalekê, di kortikekê de dirêj dike, bi kevir û xweliyê dinixumîne û berê xwe dide malê.

Dema ev xwe digîhine malê, hemî derûcîranên wî xêrhatinê li wî dikin, rewşa kar û biyanîtiyê jê pirs dikin. Tev gundiyan, zarok û pîreka hevalê wî jî qal dike ku hevalê wî li kuderê maye û ew ê kengî were. Mîna ku bêbext bersivên hemû pirsên ku ew ê bihata kirin, ji berê de di serê xwe de çêkiri bin, xemgîniyeke lihevhanî li xwe dide xuyakirin û dibê:

- Bila serê me hemiyan sax be, jiyana wî ket ser ya we. Ro-jekê ... me li ser dîwêr kar dikir, lingên wî terişî ... ket û ... biyanîti pir ... dijwar e ... ew jî... wî jî ji vê dinêya derewîn koç kir ...

Herweha şînek dikeve nava zarok û pîreka hevalê wî.

Ev çîroka êdî tê girtin û binax dibe. Dem derbas dibe, sal diqûlibe û rojek ji rojên payîzê tê. Ev î bêbext û jina xwe diçin karekî. Di ber newalek kwîr re dimeşin, Bayekî nerm li tûlika bêbext dixîne û li ser eniya wî nahewîne. Mêrik dinêre ku ji jor de tayekî kerengê ji koka xwe bûye, li ber talazoka payîzê tot dibe û ber bi newalê tê. Dema ev çav li wê tayê kerengê dixîne, ew peyva hevalê wî dikeve bîra wî û loma kenekî ehmeqane bi devê wî dikeve û dikene. Jina wî lê dinêre ku mêrê wê mîna dînekî, xwe bi xwe dikene. Rika jinikê pê digirê ji mêrê xwe re dibêje:

- Tu Xwedê dihewinî, tu bi çî dikem"? Mêrik bi ken li jina xwe vedigerîne û dibê: - Tew nepirse ... Ez bi tişteki nakenim. Jinik hinekî jî pi hêrs:

- Ma ne va ye, tu dikenî!

102

- Dev jê ber de ... çîrokek jibîrbûyî ye.

- Na mêrik, divê tu ji min re bibêjî, ka tu bi çî kenîyay? Ma ez jina te ya evqas salî me, tu ji çî vedişêrî? Ma tu şerm dild?!..

Mêrik dike nake, xwe ji destên jina xwe pak nake. Radibe vê rikebariyê dide xatirê jinên mereqdar û wan xweşhalên şevên bêdeng. Loma ew jî li wir, wê bûyera kuştina hevalê xwe di pey ewqas sal re, cara pêşîn ji jina xwe re kat dike û dûre dibêje:

- Vêca min jî nuha tayê kerengêk hişkbûyî dît ku li ber bayê tot dibe. Loma ez keniyam. De ka ... ew tayê kerengê, ew ê çi bikari be dîdevaniya hevalê min bike ku min ew kuşt!?.

Tayê kerenga hişkbûyî naçe dîdevaniyê nake, lê mêrkuj iya mêrik ji devê jina wî belav dibe, piştî demekê hestiyên hevalê wî tê dîyîn û kuştina wî li ser hevalê bêbext dipeyite. Dûre ne ewqas zêde, lê tenê bi qasî çend salan zîndanî dibe.

103

KU MERIV BIXWAZE

Ev merivê ku em ê nuha çêlî wî bikin, ji hêla jina xwe de merivekî pir dilxirçik e. Ewqas dilxirçik e ku ne dihêle jina wî bi tenê biçe nava gund û ne jî dixwaze biçe malekê. Cara ku jinik jê re bibêje, «Ev tişt ji min re pêwîst e û ez dikim biçim mala cîranekî ku peyda bikim,» wê çaxê mêrik jî radibe beriya jinikê diçe li wê malê rûdine, heta ku jinik tê wî tiştê pêwîst digirê û diçe. Dema ku jinik satilên xwe bi piyên xwe de bike û berê xwe bide bîr an jî kaniyê, mêrik radibe hêdî hêdî dide pey, bi vî awayî çavdêriya jina xwe dike, heta ku jina wî ji dorima avê vedigere. Di demên razanê de, hertim mêrik xwe dide hêla deriyê derketinê û wusa bi hev re radikevin. Lê tew ku mêvanekî wan î mên an jî xort hebe! Xwedêyo, wê rojê heta çûyîna mêvan jî, dibe gurpegurpa dilê mêrik û ji nêhirînên bi baldarî çavên wi diqurime, serê wî tijî asûwasên xirab dibe û di bin xwîdana mirinê ve dibe. Di demên weha de gav lê dibine sal û dirêj dibin. Jinik xweşik e. Bi du çavên gir, dev û pozê lihevhatî û bejneke tenik û dirêj e. Ji xwe heta anuha jinik jî bi vê xweşikiya

104

xwe xapiyaye. Ji wê wetrê mênê wê ji hezkirina wê, dixwaze ew her li ber çavên wî be. Lê piştî demekê jinik têdigêhîje ku ne wusa ye. Bi kîjan aliyê de xwe tev dide, çavên mêrik her li ser wê ye û ev çavên ha jî ne bi

nêhirînên kezkirinê ne. Rasterast wek çavên nêgehbanekî ne. Ev liv û tevgerên mêrê wê, nerihetiyekê li wê peyda dike.

Rojekê li hev rûdinin, jinek xwe nagirê û jê re dibêje:

- Ev rewşa te gelek seyr e, mêrik. Min hay ji te heye. Lê bawer bike, ew tiştên ku tu diftkirî, li ba min nîne. Divê tu tiştên weha ji min nepêyî.

Mêrik her bédeng guhdariya jina xwe dike û ne dibê erê, ne jî dibêje na.

Lê dîsa jî bi ya xwe dike. Herweha roj tîn û derbas dibin, demsal didine

pey hev û sal li xwe diqelibin. Lê mêrik her li ser xwiyê xwe ye. Ev xwiyê

wî jê re bûye wek karekî rojane. Rewş wusa dibe ku jinek jî êdî ji xwe

dikeve şikê, bi çavekî din li dora xwe dinêre û xwe weke mirîşkek namalok

dibîne. Ji ber van tevgerên mêrê xwe, jinek tetirxanî dibe û di zikreşiya

xwe de diqepije. Di dawiya dawîn de rojekê dîsa tê li ber çogên mêrê xwe

rûdine û jê re dibêje:

- Ero, mêrik ... tu were hinekî hişê xwe bide serê xwe. Bi Xwedê, ez êdî wusa bûme ku ji ber van livên te, ez jî ji xwe

ketime şikê. Tu bi xwe jî dizanî ku ez tişteki wusa naftkirim .

naftkirim ku ez bi çavekî din li mêrên xelkê binêrim. Lê .

divê tu viya jî bizani bî ku ... ku ez tişteki wusa bixwazim, ne tenê tu, çar nêgehbanên wek te jî ew ê nikari bin pêşiyê li min bigirên!..

Mêrik dîsa bédeng û bi wan çavên xwe yên şikebar e. Şi-kebarî lê bûye wek nexwesiyekê. Mêrik, bi rastî jî tişteki xirab li dor jina xwe nabîne, lê

ji gotinên wê jî bawer nake û naxwaze çavên mêrekî li jina wî bikeve.

Weke ku di çîrokê de tê gotin, jinek bi xwe jineke şîrpak e.

Lê rojekê ev livên mêrê jinekê dide dilê wê, ew jî radibe li ser vê yekê bi

awayekî banî xortekî dike û wî derbasî hêla kadîne dike. Dûre teştta xwe

ya arvan tîne datîne û destê xwe dike nava hevîr. Mêrê wê ji odê

derketiye, weke hertim anuha dîsa li ber derê hewşê rûniştiye û tizbiya

xwe diçe qîne. Bi qasekî

105

wext dibuhure, jinek destên xwe yên bi hevîr dûrî xwe radike û bi du dangan banî mêrê xwe dike:

- Ero ... ca were mîza min bi min de çû!

Mêrik bi lez û bi pişirîn tê ba jinikê, jinik herdu destên xwe hinekî ji xwe dûrdixe û dibê:

- Ca vê derlinga min ji min bişeqitîne, ez biçim kadînê. Mêrik bi herdu destan derlinga doxînlastîk ji jinikê dişeqitîne xwarê û dîsa berê xwe dide derê hewşê. Lê jinik li ber deriyê kadînê jî banî wî dike û dibê:

- Ero, were ji min re derî jî veke! Ma tu nabînî ku destê min bi hevîr e?! Mêrik tê destê xwe davêje zimanoka deriyê kadînê, ji jinikê re derî jî vedike û bi şûn de diçe. Jinik diçe kadînê.

106

MALŞEWUTtN

Hinek perên ciwamêrekî li merivekî ye. Meriv nizane ka çiqas e. Lê dîsa jî deyn deyn e. Wexta deyndayînê buhuriye û mêrikê deyndar hîna deynê xwe ne daye. Ciwamêrê ku pere daye, heta demeke dûrûdirêj jî bêdeng dîmîne ku deyndarê wî bi xwe têbigêhîje û bi xwe bide. Lê na, meh û sal jî di ser wexta wan re derbas dibin, ne pere tîn û ne jî dengê deyndar.

Ciwamêr radibe ji bêgavê bi xwe diçe mala deyndarê xwe.

Piştî pirsîna halûwexta hevdu, ciwamêr çêlî wan perê xwe dike. Mêrikê deyndar kîsê titûna xwe derdixe, cixarekek weke tilî dipêçe, dirêjî ciwamêr dike û bi rewşek hustuxwar dibêje:

- Ez dizanim, ezbenî. Ez dizanim ku perên te li min e. Lê serê tunebûnê bixwe! Ez anuha nikarim, lê ez ê wexta bêderan bidime te.

Herweha ciwamêr destvala vedigere malê û heta wexta bêderan tew qala perên xwe nake. Dem tê, piştî paliyên xwe xelk dest bi kut ana bêderan dike, dikutin, ji hev safî dikin û tenên xwe dikêşin malê. Lê dîsa jî ne pere û ne jî dengê deyn-

107

dêr tê. Ciwamêr vê carê jî radibe diçe ba deyndarê xwe. Bêyî ku zêde dirêj bike, rasterast qala peran dike. Piştî xwestina deyn, ew kîsê titûnê dîsa ji ber piştî deyndar derdikeve rastê, devê wî vedibe, cixarekek sitûr jê tê pêçandin û ber bi xwediye peran dirêj dibe. Deyndar vê carê jî bi rewşek şermezar li ciwamêr vedigerîne û dibê:

- Ez dizanim, ezbenî. Lê wek ku tu jî dizanî, destê vala deng jê nayê û merivan rûreş derdixe. Heta wexta kelandina rezan xwe li min ragirê. Ez ê wê çaxê bidime te.

Xwediyê peran dîsa bê pere vedigere malê û li bendîwexta rezkelandina ye. Piştî kelandina rezan jî ji mala deyndarê xwe destvala vedigere malê. Vê carê wexta dayîna deyn tirêjtir bûye. Heta buhara rengîn. Ciwamêrê xwediyê peran ji xwe hêrs dibe, ji xwe diqahire û xwe bi xwe dibêje: «Hetanî buharê! Ev serê min î ehmeq, ax! Çima ez perên xwe bi deyn bidime vî bêcirî, û çima ez bi perên xwe wusa biqahirim.»

Va ye buhara ku hati bû gotin, buhara rengîn jî hat. Lê xwediyê peran her bêhêvî ye. Ji ber vê yekê jî difikire ku lawê xwe î naşî bişîne ser deyndarê xwe ku ev perên wî werin. Loma ciwamêr banî kurê xwe dike û jê re dibêje.

- Kurê min, di ser wexta me re ewqas sal û meh buhurîn, lê deyndarê me hîna jî seriyani li xwe digerîne. Sibê roja wexta me ya dawîn e. Ez ne bawer im ku sibê jî perên me bide me. Ez dizanim ew ê dîsa tiştêkî bavêje ber û pê wextê dirêj bike. Bi vî serê sipî nabe ku anuha ez biçim û pevçûnekê derxim. Tu biçê û jê bixwaze. Lê te dît ku ew ê dîsa seriyani li xwe bigerîne, tu jî wê çaxê wek naşiyekî gefan lê bixwe û bibêje: ez ê mala te bişewutînim.

Lawikê naşî bi mitûmatî li bavê xwe dinêre û dibêje:

- Lê ku ew dîsa nede? Wê çaxê, ma ez bi rastî jî mala wan bişewutînim? Dema ciwamêr difikire ku deyndarê wî ê ji lawê wî re çî bibêje, bêhna wî teng dibe, renekî hêrs bûyîna li ruyê wî diyar dibe û bi wê hêrsê ji lawê xwe re dibê:

- Belê, belê. Bişewutîne! Serê wî û mala wî bixwe! Ji merivên wusa bêcir re çêyî pere nake!..

108

Bi van temiyên bavê xwe, lawik wek tivingek azo tê dagirtin. Bi rastî jî lawik sibê diçe, şûşekêk nefî dide talda xwe û dikeve rîya mala deyndarê bavê xwe. Di rê de dilê lêwik bi mala deyndarê bavê wî dişewute. U dûre xwe bi xwe: «Peyvên bavan nabe dudu» dibêje û bi temiyên bavê xwe, xwe digêhîne mala deyndêr.

Êvarek buharê ye. Tarî ketiye erdê û wusa xuyaye ku şiv hatiye xwarin. Ew ê anuha li mal be. Lawik li derî dixê, hêdîka dikeve hewşê û ber bi hundurê xênî diçe. Bi aramî heta ber deriyê oda rûniştinê jî diçe û dinêre ku çî bibîne. Deyndarê bavê wî, bi jin, keç û lawê xwe ve li hev rûniştine, selikek titûna zer mîna şîma danîne ber xwe û çend destê pel jî danîne ser. Keça wî bi kubarî cixarê dipêçe û bi comerdî dipifîne. Mîna ku hîna nû ji xwe re hînî dezgeyekî bibe, kurê wî jî giran giran pelê xwe lêv û didan dike û dûre titûnê didewusîniyê. Jina wî mîna ku ji berê de pisporê vî karî be, cixarekek kin û sitûr di nava tiliyên wê de hêdî hêdî dişewute, Mêrik jî qelûnek girtiye destê xwe î yek, bi destê din jî lepek titûn ji selikê radike dide ser serika qelûnê û wek xirarekî kayê didewusîne. Dûre jî kuzotek agir ji soba kêleka xwe derdixê, dide ser serikê qelûnê û bi fişefiş dikêşe, Lawik di devê dêrî de temaşa wan dike. Di navbera çend saniyan de hundurê odê bûye nola hêtûneke bi agirê sergînan. Weke tavên ewrên buharê dûmaneke reş girtiye hundurê odê. Hemî cixarekêş bi kuxtekuxt bi xwe de ketine û Xwedê dizane ji ber vê yekê ye ku heta nîvdeqeyekê jî lawikê li ber derî ne dîtine. Ne dûrî aqilan e ku di rewşên weha de meriv hay ji yekî hebe ku hetanî ber derî hatiye. Lewra wek pixêriyekê dû ji qelûna mêrik bilind dibe, jina wî bi awayekî wusa cixara xwe ya weke kokir dipifîne ku, mîna bêderek li ber bayê agir girti be. Keç û lawê wan, fena teyrên ku ji refên xwe ma bin, bi lez cixarên xwe dikuşkuşînin, Heta nîv deqeyekê jî kurik li ber dêrî, bi devjihevî li vê malbata deyndarê bavê xwe dinêre, ziman lê nagere ku wan ji hatina xwe haydar bike û sedemê hatina xwe ji mezinê malê re bibêje. Loma bi dijwarî xwe ji dûmana titûna wan disitirî-

109

ne ku nekuxe. Lawik bêdeng ji ber dêrî dîrdikeve û vedigere tê malê. Dema bavê lêwik tev şûşa neftê çav li kurê xwe dikeve, gelekî kêfxweş dibe ku kurê wî bi sax û silametî vegeyriyaye. Ji wî wetrê deyndarê wî perên wî şandine û loma kurê wî agir bernedaye mala wî û tavilê ziviriye. Lê gelek nabuhure, mêrik têdigêhîje ku kurê wî jî bê pere vegeyriyaye. Ji ber vê yekê bi rewşeke sipûsarî ji lawê xwe dipirse:

- Kurê min, ma te perên me ne haniye?

- Na bavo.

Bi vê bersiva kurê xwe re hêrsa mêrik ji carên hercarîn zêdetir dibe û di dest de pirseke din dike:

- Baş e, ma te agir berneda mala wan? Te mala wan ne şe-wutand?

Lawik ne bi xwîngermiya naşiyekî, bi xwînsariyek nepayî dibêje:

- Wan bi xwe ar berda bûn mala xwe ... mala xwe bi destên xwe dişewutandin,

Lawik li kêleka bavê xwe rûdine, ji serî heta dawiyê çîroka deyndarê wî jê re kat dike.

110

POŞMANÎ

Merivek di rojek havînê de rêwîtiyê dike. Riya Wî" di gelî û deviyên bê çem, bê bîr û bê kam re derbas dibe. Bi kurtî dilopek av jî li ser riya Wî" tune. Debara nan û ava xwe ya rê bi zebeşekî kiriye. Zebeşê Wî" di tûr de, tûrê Wî" li piştê Wî" û dimeşe,

Li derekî hewrazek dikeve pêşiya Wî" ku, bi kêmanî sê saetan dikêşe. Tava germa nava royê dide tîtika eniya wî, dibe şipîna dilopên xweydanê û jê têne xwarê. Her gavên xwe yên ku bi pêş de davêje, mîna ku tew li cî ne live, her li ciyê xwe ye. Hewrazê ku bi sê saetan e; lê dibe riya sê salan. Ji westê, ji serqametiya hewrêz, ji germ û kelboxa germa nava royê dev û lêv lê hişk dibin û pozê Wî" dixetî. Piştî wextek dirêj xwe digêhîne ser serê mitê hewrêz.

Bi rewşek dijwar be jî, anuha hewraz xelas kiriye û loma xwe li derekê davêje erdê. Wî dil heye ku bi qasî lehzeyekê bêhna xwe bigirê, zebeşê xwe bixwe û dûre riya xwe bidomîne. Herweha zebeşê xwe dikêşîne ber xwe, ji ber ku kêr jî li balê tune, radibe bi lez zebeşê xwe di erdê de dide, felqe dike û bi lepên xwe dikemişe ser. Du lepan li hundirî Wî" dixîne, di

111

devê xwe de datîne û qalikên wî jî davêje dorhêla xwe. Çavê wî têt dibe, dûre radibe ser xwe, doxîna xwe vedike û bi ser qalikên dora xwe de mîza xwe direşîne, Ew hemî qalikên ku havêti bûn dora xwe, di mîza wî de dilewutin. Xwe bi qasekî radimedîne, bêhna xwe digire. Dûra radibe ser xwe ku êdî têkeve riya xwe ya dûr.

Lê beriya ku bi rê keve, rengê tîbûyînê xwe lê diyar dike.

Êdî dizane ku ne nan, ne av û ne jî tiştêkî din î xwarinê pê re heye. Baş jî dizane ku li ser vê riya wî av tune. Dema ku li ser vê riya bêav û tîbûyînê dirame, ew hemî qalikên ku li dora xwe belav kiri bûn, li ber çavên wî dibe bîr û kanî.

Qalikên zebeş di binê tava royê de dibiriqin. Çilkên mîza wî ya ku li ser qalikan, ew bêtir dibiriqandin û dilê wî bêtir dibijandê. Loma diçe li ber qalikan rûdine ku bixwe. Lê çilkên mîza wî jî salox dide ku bi ser de mîstiyê. Herçendî kesek li wan derina tune, lê dîsa jî bi zanistî dilê wî nagirê ku bixwe. Ji ber vê yekê jî diviya bû bi awayekî serê xwe zela bikira û xwarina wan li xwe helal bikira.

Radihêje qalikekî, lê dinêre û xwe bi xwe:

- Mîza min li viya ne ketiye, dibêje û dixwe. Dadide yekî din û di dilê xwe de:

- Ez wek navê xwe dizanim ku li viya jî ne ketiye, dibeje û wîjîdixwe.

Dixwe, lê destê wî hîna jî ji qalikan nabe. Hîna yek di devê wî de ye, radihêje yekî din û ji bo xwarinê amade dike:

- Ez wek navê bavê xwe dizanim ku mîza min bi viya jî ne bûye, bi serê metika min li viya jî ne ketiye, bawer dikim ku li ev î ha jî... bi serê kalê min î rihmetî li viya jî ne ketiye ... û ev î din jî...

Her cara ku mêrik radihêje qalikekî, bi sonda navekî an jî bi serê nasekî li xwe helal dike û dixwe. Ya rastî, ew bi çavê xwe jî çilkên mîza xwe li ser qalikan dibîne. Ji xwe dema qalikekî ji erdê radike, berê hêdika li kevirekî piçûk dixwe, dawdişîne û dûre bi sonda navekî mezin dixwe. Ew qalikên ku pir bi mîz in, xwarina wan jî bi ser û sondên kesên mezintir dike. Ango hinek qalik bi sonda navê Xwedê jî dikevin devê wî.

112

Herweha mêrik hemî qalikan dixwe û radibe ser xwe. Li paş û pêşî xwe, li dorhêla xwe baş dinêre ku tu qalik li wan derina nîne. Loma êdî dikeve rê û hêdî hêdî dimeşe. Lê heta çend gavên pêşîn jî her li dû xwe dizivire û dinêre.

113

QAMÇÛR

Xortekî gîştî ye. Hêdî hêdî simbêla ber pozê wî li derketinê ye. Ji ber ku bavê wî ji zûde miri bû, heta nuha xelkê bi çavê sêwiyekî lê dinêrîn. Lê anuha dewsa sermiyanê malê girtiye û bi kevnepîra diya xwe ve di binê maxên xaniyekî de dijîn.

Ji rojan rojeke buhara pašîn e. Weke hertim pezê xwe berdaye berwarê çiyayê nêzîkî gund, bi xwe jî xwe daye ser zi-narekî bilind û çavdêriya pezê xwe dike. Weha carekê dibîne ku li jêra berwarê çiyê, di riyek piçûk de du karmendên dewletê ber bi çavên wî dikevin. Piştî ku tên ba xort, di pey silevek kurt re, karmend bi xort didine zanîn ku ew karmendên qamçûrê ne. Nav û pašnavê wî, navê dê û bavê wî li kaxizê dinivisînin û dûre dest bi jimartina pez dikin. Ji wan yek vedigere ser xort û jê re dibêje:

- Xorto, li gor vê hij marê, qamçûr li çar serî pezê te dikeve. Em dikin ku ber bi gundê we biçin. Ji ber karê qamçûrê em ê heta êvarê jî li wir bin. Ku te bivê, dema tu êvarê vedigerî, wek mafê qamçûrê, wê çaxê tu ê çar bizinan ji me re ve-

114

qetînî. An jî ku te bivê, em anuha jî dikarin bidin ber xwe û bibin.

Xort bi wan dide zanîn ku ew qamçûra xwe anuha bi xwe re bibin. Lewra qamçûr qamçûr e, çî anuha û çî êvarê. Dûre li gotinên xwe zêde dike û dibêje:

- Werin ez ji were veqetînim.

Ji karmendan re çar serî bizin têne veqetandin. Karmend bi xatirxwazî bizinan didine ber xwe û ji xort dûrdikevin.

Ciwanxortê sermiyanê mala diya xwe, heta êvarê pezên xwe li gelî û berwarên çiyê diçêrîne, dûre pezê xwe li hev berhev dike û berê xwe dide gund. Karmendan karûbarên xwe qedandine û ji gund çûne. Êvarê, di dotina pez de diya xort dinêre ku çend bizin kê in. Bi dudilî çavên xwe li nava pêz digêrîne û bi şik ji lawê xwe dipirse:

- Kurê min, di çav min de çend bizinê te ne xuyane. Ka ... ka bizina taq? Bizina xez û ya bel jî ne xuyaye. Kanê bizina kol?. Te îro li kuderê çêrandine? De qeyê ne gosirmet e ku gur keti bin nava pêz?!..

Xort bi dengê nizm û di ber xwe de hêdîka dibêje:

- Na na, dayê. Ne gur û ne jî diz hatine pêz. Ma te ne dît ku îro karmendên qamçûrê hatine gund. Li çiyê rastî min hatin, ew ê îro bihatana gund jî. Li wir pez jimartin, qamçûra xwe lêxistin û ji min re gotin: Çar serî bizin. Min jî rabû li wir ji wan re veqetand û kire ber wan. Ma çi hewce bû ku min heta êvarê jî ji wan re biçêranda.

Piştî ku diya kurik van gotinan ji devê lawê xwe dibihîse, satila bafûn ji destê xwe datîne, dev ji dotina şîr berdide, zûzûka diçe ber lawê xwe û her deverê lêwik saxî dike ku bizani be ka kurê wê çiqas lêdan xwariye. Lê dema jinik têdigêhîje ku kurê wê sipûsax e, tavilê bir û berdide girî ... digirî û digirî. Li sîngê xwe dixê, li çogên xwe dixê, porçika xwe dikêşîne û diqîre.

Kurik ji ber vê tevgera diya xwe mitûmat dimîne û têngêhîje ku diya wî ji bo çi wusa digirî. Herweha heta demeke kurt jî her li hêsrên diya xwe temaşe dike û bêdeng dimîne. Diya wî jî her bi xwe de dide, di nava giriyê xwe de dilorîne û:

115

- Ax!.. Bêvankes sax bûya! dibêje. Ax ku ... ku anuha Bê-vankes î sermiyanê mala min sax bûya!.. Ax ku ew anuha ne li piştta goristanê ramedî bûya! .. Ax!

Li ser van lavelavên diya xwe şikek sar li lawik çêdibe û tirsek lê radibe. Tirsê dînbûyîna diya wî dikeve dilê wî. Bi dev û lêvên ziwa vedigere ser diya xwe û dibê:

- Ji bona Xwedê, dako! Ma nuha bavê min sax bûya wî ê çi bikira!?. Bawer bike ku bavê min jî di dewsa min de bûya, wî ê jî fena min çar bizin bikira ber karmendên qamçûrî. Qamçûr vatiniyek karmendan e, rêdarek dewletê ye. Ma ji te wetrê ku bavê min ê bizinek kêmbida wan? Ez dizanim ... ez dizanim ku wî ê jî çar bizin bida wan. Ma wî ê wekî din çi bikira?

Lê her tepîn û repîna diya wî ye li defa sîngê xwe dixê, gijika xwe dikêşîne û di ber giriyê xwe re jî dibêje:

- Çawa?. çawa lawo! Çawa devê te li paşmêrê min digere ku tu jê re weha bibêjî. Tu çi dizanî., Ka tu çi dizanî ku ew çi mêr bû! Ez ... ez tenê dizanim!

Ax!.. beranê min, kavirê min, taca serê min! Xwedêyo ... ma te ê ev roja reş jî bikira kiras û li min bikira!..

Bi vê bûyerê diya kurik xwe weke kevokek rûçikî dibîne, hêviya wê şikestiya, mîna ku dinê qul bû be û di hustuyê wê de bû be. Li gor wê kurê wê ê nikari be sermiyantiya mala wê bike. Ji ber vê yekê jî wek pepûkek birîndar dikûre û digirî. Li hemberî vê diltengiya diya xwe, lawik jî diltenikî dibe û bi hustuxwarî ji diya xwe re dibêje:

- Dako! Ez bi gorî! .. Bi navê Xwedê ku bavê min jî îro li vir bûya, em ê dîsa ji wan çar serê bizinên xwe bibana. Îcar tu çima ewqas dilê xwe teng dikî, daka min!..

Daka wî di nava axîn û giriyê xwe de ji kezebek şewutî di-bêje:

- Sala ku Filankes ji Hecê hati bû, fena sala îsalîn dîsa rewşa me XWeş bû. Wê çaxê jî karmendên qamçûrê hati bûn. Ez bi xwe jî li kêleka wî bûm. Wek anuha tê bîra min ... Tê bîra min, çer ku karmend li axpînê ketin nava col û wan dest bi jimartina pez kirin, bavê te î rihmetî bi hêrs di ser wan de

116

qêriya û got: «Ez bişkulekî jî nadime wel» Yek ji wan û yek ji bavê te î rihmetî, welle dadan bejnên hev, hevdu gelekî birin û hanîn û dûre herdu karmend ketin ser bavê te î rihmetî. Wusa li bavê te dan, wusa lê dan ku ... heta ku bavê te ji hiş de ket, ew ji ser bavê te ranebûn. Ji pîn û çoyên ku wan li bavê te xisti bûn, tevayiyê laşê bavê te reş û şîn bû bû. Heta ku karmendan qamçûra pêz birin jî, bavê te li rasta wê axpînê bêhiş bêhiş dirêj kirî bû. A beranê min jî mêrekî wusa bû! Ma bê repik û bê ço, wî tew dihişt karmend qamçûrê li pêz bixînin!

Kurik gelekî li ber vî hişê diya xwe dikeve, bi awakî bêmane dibêje:

- Lê dûre?.

- Dûre jî bi alîkariya gundiyan, me bavê te kaşî malê kir.

Me ew di nava nivînan de ramedand û heta heşt ro û heşt şevan jî devê xwe bi nan û avê ne kir. Ji xwe mirina wî jî ji ber vê yekê bû. Ji wê salê û heta îro jî tişteki me î qamçûrê çênebû û çavê me bi karmendan ne ket. De ka ez binêrim bê te çend ço xwarine, tu mêrekî çawa ye! QaşO tu jî kurê wî ye! Lê na ... ez bawer nakim ku te tew şivek jî bi xwe kiri be. Ez

dizanim, çer ku ew hatine û ji te re pîvana qamçûrê gotine, te jî pez veqetandine û kirine ber wan. Ma ez bi te nizamim!..

Bêhna kurik ji vê pitepita diya wî teng dibe û derdikeve der.

117

RENV ANDÎNA QEREÇÎYEKT

Ji malmezinan, xortek dil dikeve keçek qereçî. Bi sal û mehan riya hev dipên. Xort û keçik carina hevdu li derinê xewle dibînin. Di her hevdîtina xwe de lawik sermest dibe, lê ji malmeziniya malbata xwe, xwe nade ber revandina keçika qereçî!"

Rojekê, li ciyekê xewle êdî dide dilê lêwîk ku biryara xwe bide. Vê biryara xwe ji keçikê re jî vedike, li wir li hev dikin, herdu didine pey hev û xort berê wê dide cî û warên malbata xwe.

Dûre eşîra qereçîyan pê dihese ku keçek wan hatiye re-vandin. Rîspiyên qereçîyan li hev dicivin, peyvên xwe yek dikin, di nav xwe de biryarekê digirên û çel peyayên xwe yên çekdar dişînin ser eşîra malmezinan. Ji bo parastina xwe, eşîra malmezinan jî bi qas!" çel naşiyên xwe yên çekdar dişînin pêş, Herweha çekdarên herdu aliyan li derekê pêrgî hev tên û li ber hev pan dibin. Ev şerê ha ji bo herdu seriyan jî şerekî pîrozwer e, şerekî doza namûsê ye.

Bi çek, bi şûr û mertal ev şerê namûsê sê şev û sê rojan di-

118

dame û xwîn diherike. Di vî şerî de her çel peyayên eşîra mal-mezinan jî dikevin. Ji bo ku keçikê bi şûn de nedin, serokeşîrê malmezinan radibe ewqas peyayên din jî bi rê dike. Di dawiya dawîn de şer xwe bi xwe sist dibe û ditefe. Eşîra qereçîyan bi çend birîndarên xwe ji qada şer vedigerin warên xwe.

Herweha şer tefiyaye, herkes ji qada şer vekişiyaye, birîndar di nava nivînan de û kuştî jî li pişt goristanan hatine ra-medandin.

Piştî sê rojên pêşîn mezinê malmezinan, xortê eşîra xwe û keçika qereçî dide bankirin. Dilê xort gelekî xweş dibe ku mezinê eşîra wan ê mara wan bi destê xwe bibire. Xort û keçik bi dilşadî heta ber qonaxa mezinê malmezinan tên û ev hatina wan ji jor re tê gotin. Çend malmezînên rîsipî

jî weke şêwirmendan xwe dane kêleka mezinê xwe û rûniştine. Mezinê malmezinan weha carekê li şêwirmendên dora xwe dinêre:

- Me ji bo keçikê ewqas peya dane kuştin. Ma hûn bawer dikin ku keçik bi qasî xwîna çel peyayî xweşik be, dibeje û di dest te vedigere ser balbasên ber dêrî û jê dixwaze ku ew xort û keçikê bînin hafa wan.

Gelek nabuhure xort û keçik weke du pêlên bextiyar dikevin hundur, herdu jî bi rewşek giramgîr silavê li mezin û rîsîpiyên eşîrê dikin. Çavên herdu xortan jî wek agirekî dildarî dişewutin.

Lê dema ku mezinê malmezinan çav li keçika qereçî dikeve, gwînê wî divemire, mirûzê wî tûj û tirş dibe û keçik li ber çavên wî dibe wek marekî reş. Keçikek reş, lêvdaliqî, çavbeloq û poz dirêj e. Keçika qereçî li ber çavên wî weke qijalekek reş dixuye. Li gor pîvanên mezinê eşîra malmezinan, ew ne keçikek lihevhatî ye. Bi dengê re xort û keçikê dişînin derve, piştî ku mezinê malmezinan li rîsîpiyên dora xwe jî dinêre, tavilê fermanê dide balbasên xwe û ji wan re dibêje:

- Ev tiştê ku vî xortî kiriye, bi xwîna wan peyayên me nake.

Loma jî divê hûn vî xortî bibin û tavilê bi darde bikin. Zû ne-sekinin!..

Bi vê fermanê re balbas diçin radihêjin piyê xort, ji wir dûrdixin ku êdî bibin fermana mezinê malmezinan bi cî bînin.

119

Kurik hay ji vê ferman û biryarê tune ku ew ê bête dardekirin. Lê ji rewşa balbasan derdixîne ku tevliheviyek heye. Di nav lepên balbasan de, bi livek bêhay ji wan dipirse û dibê:

- Çi ye?. Ma hûn çima ewqas bi hêrs in? Ma hûn min bi kuderê de dibin? Ji balbasan yek, xwe nagirê û bi hêrs dibêje:

- Ev fermana serokeşîr e. Em ê te bibin bavêjin dara sêpê.

Lewra keçika ku te revandiye, bi xwîna ewqas peyayên me

AkA ak Lo A AJ.;~;'t

yen 1lşh n e. ma ... têngêhiştî ...

Xort dinêre ku bi rastî jî ew ê bête dardekirin. Li ber balbasan digere, dilê wan bi xwe dişewutîne û ji wan re dibêje:

- Ez bi gorî! Fermana mezinê me, li ser ser û herdu çavên min. Lê beriya ku ez werim dardekirin, ez dixwazim du peyvên xwe yên dawîn ji mezinê

me re bikim. Ez ji we lava dikim ku hûn vê daxwaza min bigêhîn mezinê me.

Li ser vê daxwaza xort, balbasek diçe û mezinê eşîrê ji vê yekê haydar dike. Dûre bi fermana mezinê malmezinan, xort dîsa tê hafa rîsîpiyên eşîrê. Lê dema ku serokeşîr dîsa çav li xort dikeve, ew hemî peyayên wî yên kuştî, yek bi yek tene ber çavên wî û loma bi hêrs di ser xort de diqîre: - Tu hîn dixwazî çî gotinan bibêjî? Ma tu nizanî bê te çî gû belav kiriye! Me çel peyayên mêrxas ji bo rûçekura dergistiya te da kuştin. Ji te wetrê ku ew çavbeloqa qereçî bi xwîna ewqas zilamên me dike?!.. Ev yeka jî, tu bûy sedem. Ji ber vê yekê jî divê tu bêy dardekirin û hew!..

Xort bi tevgerek giramgîr heta dawîya gotinên serokeşîr bêdeng disekine û dûre ew dest pê dike:

- Tu mezinê me î, taca serê me î, nîşana eşîra me î ••• lê min xwesti bû ku ez du gotinan bikim, ezbenî. Gotinên min jî ev in: Ku tu ji bo xwîna rijiyayî bibêjî, rast e. Dardekirina xwe, divê ez biçim bi destê xwe bikim. Lê ku tu di warê bejnûbal, dev û lêvên keçikê de bibêjî, wê çaxê na! Ji bo ku tu bêhna xwe teng nekî, ez ê ji te re çîrokek kurt bibêjim: Dibêjin ku carekê şivanekî dil ketiye bişkulekî bizinê. Ewqas dildarî bişkul bûye ku, şev û roj ew bi we re gerandiye, serî gavê ji bêrîka xwe derxistiye, lê nêhiriye û dilê xwe pê XWeş kiriye. Dîsa jî

120

jê têr ne bûye. Di dawîya dawîn de rabûye ew di nava şîr de hûr kiriye û xwariye. Çîroka min li vir qediya, lê tiştê ku ez bibêjim hîna maye. Ez jî dixwazim bibêjim ku ev rûçekur û çavbeloqa qereçî, min bi çavê xwe dît û ev dilê di defa sîngê min de kete wê. Ku tu hîn jî ne bawer î, wê çaxê fermo ji te re çavê min û tu bi xwe lê binêre. Belê, ezbenî ... min ji bo vê yekê revand.

Li gel ku xort gotinên xwe qedandiye, mezinê malmezinan ketiye geliyên ramanekê kwîr û heta gavekê jî her difikire û diponoje. Wusa xuyaye gelekî di bin bandora van gotinên xort de dimîne û ji meziniya ma1meziniya xwe şerm dike. Piştî ku lêborînê ji xort daxwaz dike, fermanekê jî dide rîsîpiyên dora xwe ku bi çel def û çel bilûran, şayiya zewaca xort û keçika qereçî li dar bixin.

121

MERivEKÎ sAXiK

Ev merivê saxik li malek kêleka gund de dima. Gelek kê m dipeyvî. Ku yekî jê tiştekek nepirsiya tew peyvikek jî ji dêv der-nediket. Tu xisara wî jî li kesekî ne dibû. Pirî caran dervediket û ne diket nava civatan. Hertim xwe ji civatên şorgerm dida hev û diparast. Wusa xuya bû ku xwe ji merivan jî vekişandi bû. Herçend vê rewşa wî bala gundiyan ne dikişand, lê gundiyan jî nizani bûn ka ji bo çi ye.

Rojekê li gund dengê def û zirnê erd û asiman diqelişand.

Wî jî di mala xwe ya li perê gund de pal dabû. Ji ber ku têkiliyên xwe ji merivan birî bû; ne dengê def û zirnê û ne jî dengê jama dêrê dibihîst, Serê xwe êdî wusa zelal kiri bû ku tew tiştekekî bala wî ne dikişand.

Di ber ciyê şayiyê re derbas dibû û diçû karê xwe. Ji zingîna def û zirnê darûber di cî de diricifîn. Lê deng ne diçû wî. Ji temaşevanên dawetê, yekî nola wî hate pêşiyê, dada piyê wî, bi xwe re bir û govend pê da temaşekirin. Mêrik çû, lê ne ket govendê û ne jî mîna yê din xwe kişand ber sîtilên tirş û goşt. Tenê temaşe dikir.

122

Yên ku li ber dengê def û zirnê xwe dicirifand, yên ku li ber sîtilên tirş û goşt rûllîştî bûn û zikên xwe dadigirtin. Bi qasî ku saxik li govendê temaşe dikir, bi sê ewqasî din jî, çavên wî li kesên dorê, li beroş û kevçiyên bû. Di ber van awurên xwe re, carna jî di bin simbêla xwe ya weke rêşî de dipişirî, Herkes li gor xwe bi tiştekekî ve mijûl bû. Kesî kes ne didît, Lê ew tenê betal dixuya.

Wî bi xwe jî hîna nizanî bû ku daweta kê ye, an jî ev şayiya ji bo çi ye. Dibe ku yê di dîlanê de, bi xwe jî nizanî bûn. Lê dîsa jî ji xwarina tirş û goşt, ji hejandina xwe ya li ber def û zirnê, ji ketina govend û dîlanê û ji berhevkirina hesk û kevçiyên ne diman.

Saxik dûre têdigêhîje ku ev dîlan ji bo derxistina bûkekê ye. Piştî nîvsaetekî, bûkek xemilandî xuya bû. Xwedê ji xwediyan re bisitirîne, bûkek gelekî sipehî bû. Di nava xişm û kincên xwe yê bûkaniyê de xweşiktir dixuya. Zava jî ne xirab bû. Bi rastî jî li gor hev bûn. Bi alîkariya çend kesan, herdu jî ketin paş deriyê odeyekê. Bi hev şa bin!

Bûk û zava keti bûn odê, agirê binê sîtilan tefiya bû.

Deng ji hesk û kevçiyarên jî hati bû birîn. Qada dîlanê ker û bê-deng, xwîdana eniya beşdarên dîlanê sar bû bû.

Gelek nabuhure, merivek ji ber şibaka bûk û zavê hat rasta hewşê, berê çardexura xwe bi jor de kir û destek berda. Bi dengê çardexurê re, ew qada ku bi gavekî beriya nuha şênayî û bi her babetên merivan xemilandî bû, tavilê bû dolek melûl û herkes belav bûn. Jin û zarok ji berê de ji wir çû bûn. Mêr û xortên giştî jî yeko yek dihatin ba hev, dibûn refê dudu dudu û bi pişirîn ji wir diferqizîn. Ji bilî saxik tu kes li wir ne ma bû.

Ev rewşa ha gelekî bala mêrikê saxik dikêşîne, Aya çima ev kesên ha dibûn cot? Saxik kwîr kwîr difikire, lê tişteki ji hev dernaxîne. Bi qasekî din jî çavnêriyê li wan dike, dibîne ku ev kesên ha bi bûyîna cot û ref jî namînin. Devê xwe dixin guhên hev û bi hev re bêdeng dipeyivin. Tişteki ji qisedanên wan ne dihate fahmkirin. Piyên wan di piyên hev de, lêvên wan dileqin û bi dizî dikine pistepist.

Yekî ku pê nizanî bûya, ew ê bigota ev li ser şênkirin an

123

xirabkirina welateki dipeyivin. Heta nuha tu mereqa tişteki li saxik çênebû bû, lê êdî nexweşiya mereqdariyê bi wî jî girti bû. Ji kerb û hêrsa xwe dinepixî, diwerimî, bêhn lê teng û serî lê tevlihev dibû.

Ji hêlekê ve qisedanên bi dizî û ji hêlekê ve jî, tenêmayîna wî. Hêrsek mezin li wî rabû. Saxik ji temaşekirina dîlanê gelekî nerihet bû.

Li dora xwe dinêhire, ew î ku bi qasekî berê hati bû pêşiya wî û ew kaşî ber dîlanê kiri bû, mîna yê saxik, ew jî li ber dîwêr bi tenê maye. Kesekî piyê xwe li piyê wî jî ne xisti bû. Ji bo ku tevgerên wî jî bala hinekan bikêşîne; mêrikê saxik bi bez diçe piyên xwe li yê wî dixîne û bi lez ji qada dawetê vedikişîne. Herwekî yên din, ew jî dest pê dike û pê re bi dizî dipeyive. Saxik ewqas bêdeng dike pistepist ku, ew rebenê di piyê wî de jî tişteki têngêhîje. Saxik jî her jê re dibêje:

- Ca were ... ca tu were!..

Û ji aliyekî ve jî, gav li dor xwe û gav li paş û pêşê xwe dinêre. Yê xelkê tenê qisedanên wan bi dizî bû. Lê yê saxik, qisekirin, bazdan, lezkirin, nêhirîn, ew rewîştta ku bi piyê hevalê xwe girti bû ... herweha bi tevayiya

xwe dizî dixuya. Tew yekî ku bi viya nizani bûya, ew ê bigota qeyê ev diçin diziya mirişkan. Rebenê ku di piyê wî de, xwe li vê hêlê û wê hêlê davêje û dibê:

- Çi ye? ... çi teba ye? Tu çima wusa dila"? Ma tu min bi kuderê de radikêşînî?

Ew î saxik jî, her rebeno li pey xwe diqoqizîne, digijgijîne û «Tu were! Ca tu were ... » dibêje. Bi vê rewş û van tevgerên wan bala hemiyar jî tê kişandin.

Piştî saxik baş têdigêhîje ku vê tevgera wî bala hemiyar kişandiye, hêdîka devê xwe ber bi guhên rebenê kêleka xwe dike. Dilê rebenê ku di piyê wî de jî wusa davêje ku, bi meraqdarî guhên xwe vedigirê ku ew ê çi jê re were gotin. Saxik dîsa bi dizî li dorhêla xwe dinêre û jê re dibê:

- Ma tu gûyê min naxwî?

Li ser vê gotina wî, rebenê ku di piyê wî de, lê dimîne heyirî. Mîna ku yekî kunek ava sar bi ser de rijandi be, sipû-

124

sar dibe. Nola ku bibêje «Ev çi bû?» Lê dizivire û jê re dibê:

- Ma tu çima ji min re wusa dibêjî? Ev çi bû, ji nişka ve?

Ma ...

Ev î saxik li yê reben vedigere û dibê:

- Lê ... ev hemî xelkên ha ji hev re dibêjin çi?

125

MERivt Li BER BtN

Rojekê du balbasên Paşayê navçe, tîn li ber deriyê merivekî disekinin û pê didine zanîn ku Paşê fermana dardekirina WÎ derxistiye. Mêrik bi xwe nizane ku fermana dardekirina WÎ ji bo çi rabûye. Mêrik ne dipirse û ne jî tiştêkî wusa tê ser hişê WÎ. Tenê di dilê xwe de: «Ka ez biçim, binêrim bê Paşa çi ji min divêt.» dibêje, bêyî ku deng bike kincên xwe li xwe dike, xwe tevdipêçe û dide pêşiya balbasan.

Di vê navberê de jina mêrik jî vê fermanê dibihîse. Ew jî radibe, zûzûka çi kincên wê yên xweşik hene, çi xişmê wê yên ZîV û zêrîn hene, derdixe û hemûyan bi xwe de dike. Biskên xwe şe dike, guliyên xwe dihûne, kilên ber çavên xwe dikêşîne û xwe dixemilîne. Jinik, viya ji bo dilxweşkirina

mêrê xwe dike. Lewra dizane ku ji keçaniya xwe heta bûkaniya xwe û ji bûkaniya xwe hetanî îro jî wê ev hemû tiştên xwe bi xwe de ne kirine û mîna îroyîn wê xwe ne xemilandiye. Ev cara dawîn bûya jî, jinikê dixwest rindbûn û xweşikiya xwe rayî mêmê xwe bide û pê dilê Wî xweş bike. Mêmik vê rewşa jina xwe jî têngagêhîje û napirse. Herweha jinikê jî daye pey mêmê xwe û bal-

126

basan, diçe. Di rê de gelek ramanên têvel di serê mêmik de diçin û tîn: «Aya ev fermana dardekirina min ji ber çi sedemê ye? Dibe ku hinekan kumreşî li min kiri bin û giliyê min di P3şê de kiri bin,» Pirs û asûwasên weha di serê mêmik de pêl didin. Lê dîsa jî mêmik belengaziyê nake û xwe li hemberî vê fermanê asê nake.

Dema ku mêmik derdixin hafa P3şê jî mêmik dengê xwe nake, sedema fermana darderkirina xwe napirse. Tenê tişteke bala wî dikêşîne, Dirûvên P3şê û ev rewşa jina wî.

P3şa bi livandinek destê xwe bi balbasên xwe dide zanîn ku ew mêmik bibin û bi darde bikin. Balbas tavi lê radihêjin piyê mêmik û ber bi rasta dara sêpê dibin. Jina wî jî her bi wê xemlûxêza xwe, li pey wan e. Mêmik carina li ser piyê xwe dizivire û li jina xwe dinêre. Bi rastî jî ji bo mêmik ev cara dawîn e ku ew ê jina xwe bibîne, û ev cara pêşîn e ku ew jina xwe weha xweşik dibîne. Çiqas jî lê hatiye, Xwedêyo! Fîstanekî tenik di xwe de berdaye. Heta nivê hingulên li ser sîngê wê vekiriye. Hingulên wê di binê vî fîstanê tenik de wek hinarin negiştî serî hildane û bel bûne. Ew çîpên wê î sipî û dirêj wek du sitûnên ji dara bîya sor, di binê fîstanê sor î tenik de xuya dikin.

Piştî ku mêmik çend caran çav li vê rewşa jina xwe dikeve, ewkê mêmik di nava şeqên wî de serî hildide û mîna ku tîna tava germa havînê dabe piştî marekî reş, tevzê tîne soxê mêmik û ji hev dikêşe.

Ji hêlekê ve fermana P3şê, ji hêlekê ve xemlûxêza jina wî û ji hêlekê ve jî li ber dar û benê mirinê ev serhildana soxê wî. Balbasan mêmik hanîne ber dara sêpê, kirasekî sipî li mêmik pêçane, dikin ku êdî hilboqa bîn bavêjine hustuyê wî û kursiyê ji binê lingên wî bikêşin. Di vê navberê de ewkê mêmik jî di kewna raperîna xwe ya dawîn de ye û di nava çîpên wî de bûye

wek singekî. Dema mêrik li ser van hemî tiştên ku bi serê wî de hatine, difikire, bêhemd biqînek pê dikeve û dikene. Balbas lê dimînin heyirî, di cî de sipûsar dibin û têngêhîjin. Balbas berê li hev dinêrin û dûre vedigerin ser mêrik û bi mitûmatî dipirsin:

127

- Ev kenê te bi kê ye û ji bo çi ye?

Vê carê mêrik kenê xwe hûr hûr didomîne û di ber re jî bi rewşek ewle dibêje:

- Ma çi dibe ku hûn têngêhîjin bê ez ji bo çi keniya?

Hûn li karê xwe binêrin.

Ji balbasan yek lê hêrs dibe û dibê:

- Na! Divê tu bi lêv bikî ka tu bi çi keniya! Mêrik dibê:

- Binêrin, ez jî têngêhiştîme ... Hîn jî têngêhiştîme ku ji bo çi P~ fermana dardekirina min rakirîye ... têngêhiştîme ku li ber vî benê mirinê, ev xemlûxêza jina min ji bo çi ye ... û ez têngêhiştîme ku li ber mirinê ev soxê min çima serî hil-

dave û ah A A1.~~ • b• ~

aye u newe ... têngêhiştîme, ez 1 gon ...

Piştî van gotinên mêrik, balbas li hev dinêrin, lêvên xwe diqermiçînin û tiştêkî ji hev dernaxînin. Lê mêrik destên xwe dide ser milên wan û dibêje:

- Tew mitûmat nebin. Tiştê ku ez têngêhiştîme eve: Aqilê ku di serê P~ de, aqilê ku di serê jina min de û aqilê ku di serê ewkê min de ... wek hev in.

Vê carê jî, balbas li hemberî vê wêrekiya mêrik dimînin heyirî, zûzûka devê mêrik girêdidin û tawilê P~ ji vê rewşê haydar dikin. Li ser vê yekê beriya ku mêrik bête dardekirin, P3şa dixwaze pê re bipeyive. Balbas vê daxwaza P~ bi cî tînin. Mêrik, jina wî û herdu balbas li hafa P~ sekinîne. Çavên mêrik her li wan xirabciyên jina wî ye û ewkê wî jî wek berê ye. P3şa bi hêrs di ser mêrik de diqîre û dibê:

- Ku te li ber dara sêpê çi goti be, divê tu anuha bê kêmanî wan gotinên xwe ducar bikî!

Bi bêhnek fere û tevgerek xwînsarî mêrik dibêje:

- Heta anuha jî ez nizanim ka min çi gunehkarî kiriye ku Paşayê min î mezin fermana dardekirina min rakirîye. Ya din, ev çend salên min û vê

jina min e ku em bi hev re zewucî ne, lê tu rojekê-jî min ew bi xemlûxêza wê ya îroyîn ne dîtiye. Ya sisiyan jî, ez î ku li ber dar û benê mirinê me ... ez dinêrim ku ... ku ev ewkê min di derpê de nahewe ...

Di vê navberê de mêrik destê xwe ber bi pêşa kirasê xwe î

128

sipî dike ku pêşa xwe bilind bike û ji P~ re bibêje: «Ku tu ji min bawer nakî, wê çaxê bi çavê xwe bibîne» û didomîne. A ez jî bi vê yekê keniyam û min got: «Aqilê ku di serê P~ de, aqilê ku di serê jina min de û aqilê ku di serê ewkê min de, wek hev in.»

Li ser van gotinên mêrik, Paşa zûzûka li balbasên xwe diqîre û dibêje:

- Zû vî merivî bavêjin derve, azad bikin bila biçê! ..

129

BÛKA NÛ

Rojekê keçikek li malbatekê dibe bûk. Hîna di rojên xwe yên pêşîn de ye. Li gor hoy û zirûfên bûkekê, divê ew di van rojên nû de, bi xezûr û tiyê xwe re nepeyive. Her bi livên marîfet û şermok be. Ku bûkek, bi xwe ne wusa be jî, divê di van rojên xwe yên pêşîn de bi tevgerên weha be.

Ji bo ku bi tevgerên xwe ji tora civakî dernekeve der, ew jî her xwe diguvişîne. Bi xezûrê xwe re napeyive, lê karê xwe dike û guhdariya wî dike. Bersiva pirsên tiyê xwe nade, lê gotinên wî bi cî tîne. Pêwendiyên wê û mêrên malbatê, xesû û gorimên wê pêk tîne û tenê bi wan re bideng dipeyive. Ev peyivîna wê ya bi xesû û gorimên wê ve jî, ji mêrên malbatê kesek nabihîse.

Hîna heştê wê ne qediyaye û ne çûye zê. Hetanî wê rojê jî ji peyayên malbatê qet kesî dengê wê ne bihîstiye. Bi kurtî, bûka nû hîna ji pîvanên bûktiyê derneketiye.

Di van rojan de, wek herkesî mîza wê jî tê û diçe axo. Li axo, bi vî karî re, ba bi ber dikeve û dengê naxweş ... Mîna ku çiya di ser de biqelibe, giraniyek xwe dide ser milên wê, di

130

nava xwîdaneke sar de mitûmat dimîne. Bi guhên xwe bawer nake. Di lêvên xwe yên tenik de gez dike, qevda biskê xwe î kej dikêşîne û ji şermezariyê dilerize, diricife û dicirife. Wê çaxê dilê wê gelek dixwaze li

ciyekî dûr û xalî bûya. Lê êdî çavên wê yên avî jî jê re dibêjin ku: «Va ye gayê belek li quncikê axo, li ser afirê xwe dikayê û ev ne xewna şevên xewgiran el»

Bûk bi gwînekî vemirî ji axo derdikeve û êdî piştta wê ji gayê belek kul e. Dibe ku gayê belek ev baberketina wê, ji hinekan re bibêje. Sê rojan nan bi gewriya wê de naçe. Hustuyê wê rast û serê wê ji ber ranabe. Mîna ku di şînê de be, ken bi ber devê wê nakeve. Ev bûyera ku di serê wê de hat; jê re dibe kula salê û roj bi roj di ber de divemire, diçilmise, dihele ... Ev rewşa bûka nû, di malbatê de bala herkesî dikişîne. Li hêlekê xesûya wê dikeve binçengê bûkê, li hêla din gorimên wê dest havêtinê û ji wê dipirsin ... Lê di dawîya dawîn de bûk bi devê xwe kula dilê xwe ji xesûya xwe re kat dike.

Xesûya wê jî ji wê ne kêmtir e. Dema xesû dibihîse ku xe-zebek wusa li serê bûkê qewumiye, bi rewşek bêgavî hustuyê xwe xwar dike û jê re dibê:

- Ku wusa be, divê em zû xezûrê te ji vê yekê haydar bikin û pê bişêwirin. Û çîrok xwe tavilê digihîne xezûr jî. Xezûr diponije û gelekî serê xwe di ber vê girêkê de dêşîne. Dûre çareya herî baş di serjêkirina gayê belek de dibîne.

Derûcîranên ku serjêkirina gayê sipisax dibihîsin, hinekî li ber dikevin. Lê dîsa jî ji xwarina xwe namînin. Lewra mezinê malê, ango xezûrê bûkê bi goştê gayê belek û bi devê seydayê gund, mewlûdek bi sê zimanan (farisî, kurdî û erebî) dide xwendinê û tirş û goşt dide xwarinê.

Piştî mewlûdê û beriya ku civat belav bibe, xezûrê bûkê diçe û vê bûyerê di guhê seyda de jî kat dike. Mîna ku bi vê bûyerê çilkek gelekî xirab firiya be ser şerefa gund, seyda bi mirûzekî tirş û tal difikire, diponije û diponije... Ew tirş û goştê ku li ser mewlûdê xwariye, lê dibe jehra marekî kwîr û hemî di pozê wî re tê. Kwîr kwîr difikire, dikeve nava ilmê

131

xwe î fere û li rêyekê digere ku pê gundê wan şermezar dernekeve. Viya jî ji berpîrsîyariya xwe dike.

Herwekî bûkê, xesûyê û xwezûr; seyda jî riyekê dibîne ku pê ji nava vê rûreşîya giran derkeve. Wî ê jî ev bûyera belengaz, ji xelkê gund re bigota.

Seyda ji nişka ve radibe ser lingan û dibê:

- Civata misilman! Divê hûn bizani bin ku ev mewlûda ji goştê gayê belek, ji bo çî hate dayîn. Wek her bisilman û şe-refmendekî vî gundî, divê hûn jî destên xwe bidin ber çilkên xirab ku ... ku navê gund xirab dernekeve. Bi kurtî... min ê bigota ku bêhemdê bûka gundê me, di axo de ba bi ber keti bû û vî gayê reşbelek jî bihîsti bû. Îcar em dixwazin ku bila herkes bi devê xwe kari be û li devernê xend vê bûyerê veneke! Ku nas û dostên kê li bajêr hebe, ji kerema xwe re bila wan jî haydarê vê kêmasiya me bike, da ku şerefa gundê me nekeve nava lingan.

132

ŞtNABÎKEN

Yên ku av dikişandin, yê ku binê sîtilê ar dikirin, yê ku silawat li navê Mihemed dibarandin û yê ku bi hewar û girî porê serê xwe dikişanadin.; Rasta hewşeke mezin bû bû qada şîn û girî.

Merivek miri bû. Her yekî di ber xwe re karek kiri bû û ji bo hilaînna cendek hertişt hati bû kirin. Cendek hati bû şûştin, bi capûnekî sipî hati bû pêçan û di nava civatê de hati bû dirêjkirin. Seydayek li ber serê cendek rûnişti bû û di ser de dixwend. Civata li dorê xwe ker kiri bû. Ji hêla hundurê malê, dengê kûrîna jinan bi awakî dilşewat dihat. Herkesî serê xwe xisti bûn ber xwe û bêdeng diponijîn. Du lawên vî cendekî mirî jî di nava vî civatê de, li kêleka cendekê bavê xwe rûnişti bûn. Seyda li ber serê cendek xwe xwar û rast dikir, ji civatê silawat berhev dikir û di ser cendek de direşand. Tu kesekî wext tune bû ku li dora xwe binêriya. Lê ji kurên vî ciwamêrê mirî, yê piçûk bi dengê seyr re serê xwe rakir û li P3ş xwe nêhirî. Ji şeytanî re kerê wan jî hati bû hewşê û ewkê xwe daxisti bû xwarê. ReWş3. kerê gele-

133

kî bala lêwik kişandî bû. Ne dûrî aqilan e ku ji civatê hinekên din jî ev rewşa kerê diti bûya. Lê anuha ne dibû ku wan serên xwe rakira û pê bala hinekên din jî bidakişandin. Lê lawik weke wan ne difikirî. Çer ku çavên wî bi vî rewşa xirab ket, zûzûka rabû ser xwe, beziya kadînê, çardexura bavê xwe î rihmetî ji binê kayê derxist û hanî.

Civat hîna weke berê di şîDê de bû û seyda xwendina Qu-ran'ê bédeng kiri bû. Di vê navberê de kerê jî ewk li xwe kiri bû wek boça bêrê, li binê zikê xwe dixist û serî lê diwerimand. Xuya bû ku kurik gelekî bi hêrs bû. Ji nişka ve çardexur derxiste rastê, berika pêşîn hajot ber devê wê, dirêjî ser kerê kir û taviê xeşabek tê de vala kir. Lê ji ber ku xwîna kerî hîna germ bû, ewkê wî zû bi zû sist ne bû. Heta gavekê jî wek darekî sekinî bû. Bi dengê çardexurê re serê seyda û hemî kesên civatê, ji zû de ji ber wan rabû bûn û hemûyan berê xwe dabûn lêwik û kerê. Tew hinek ji ciyê xwe jî rabû bûn.

Tevayiyê civatê ev rewşa dit. Hinekan hîn jî bi mitûmatî dinêrîn, dilê xwe bi kerê dişewutandin, Lê hinekan jî di zimanên xwe de hişkîrî gez dikirin ku kenekî dengdar bi wan nekeve. Tenê yekî rîsipî, wî tenê bi niçeniç serê xwe li ba dikir. Dûre vegeya ser lawik û lê hêrs bû:

- Lawo, ew çi bû ehmeq!

Ew î ehmeq bi pozbilindî pifi lûla çardexura xwe kir û got: - De welle lo!..

Em li vir di şîDê de ne, ew jî .. Ji bo bavo

ewqas merivên mezin ketine şînel.,

Çend dengên ken hat bihîstin, lê taviê bi deng kuxiyan û

ev dengên ken li xwe wenda kirin.

Ew î rîsipî bi hêrsa xwe ya berê dîsa li kurik qêriya û got: - Lawo ... de ji vir bicahime, ehmeqê pîs!

Dema lawik çardexur di ber piziya xwe re kir, serê xwe jî vê re xwar kir û di ber xwe de got:

- De weHe lo ... Me hîna laşê bavo hilnaniye, ew jî hatiye rasta hewşê û mîna ku bibêje: «De ji ewkê min ve jîl.,»

Rîsipî dît ku lawik ê hîn pir bipeyive, ji ciyê xwe rabû, ber bi kurik çû, bi hêrs gopal lê bilind kir û got:

- Bicahime, ji te re dibêjim! Ehmeq! Ev çi gû ye tu belav

134

dild?!.. Rezîl! Bicahime ji vir!..

Çend kesan bi kenê xwe ne girtin, bi kuxtekuxt ji ber cendek hinekî vekişyan. Kurikê ku gef ji rîsipî xwar, xwe ji ber gopalê wî vekişand û dûre çû li ber laşê kerê kuştî, ji piya sekinî, bi awurên mêrxasekî li kerê mirî

dinêrî û carina jî pozika sola xwe li binê boça wî dixist û di ber xwe de digot:

- Çawa ye? Tu anuha têgêhiştî ku ez li merivan çî dikim, newusa?

Birayê ku di nava civatê de li teniştê cendekê bavê xwe bû, rabû ser xwe, berê xwe da birayê xwe î piçûk got:

- Ero, ma tu hîn piçûk î?. Ma tu şerm nakî ... tu şerm nakî ku cendekê bavo li vir dihêlî û tu diçî di ser laşê kerê re disekinî. Na xwe tu laşê kerê ji cendekê bavo diçêtirînî, ne wusa? Tu bi xwe jî dizanî ku bavo pir ji te hez dikir ...

Kuxtekuxt dîsa bi civatê keti bû. Rîsipî serê xwe li ba kir, vegeriya ser seyda û bi dengê bilind jê re got:

- De zû bixwîne û biqedîne, malava! Ev çî minemina te ye!

De biqedîne, em jî zû vî cendekî rakin û hew! Em ê nuha di nava van ehmeqan de dîn bibin!

Seyda, xwendina Quran'ê leztir kir.

135

XWARÎNEKE XWEŞ

Li malekê anuha xwazgînî û xwediye malê li hev rûniştine û ketine qirika hev. Xawzginî dibêjin heft, xwediye malê dibêjin heşt û herweha li ser qelend li hev nakin. Xwazginî ji xwediye malê re nabêjin ka keçik li kuderê ye, çawa ye. Lewra ji bo wan ne girîng e ku keçik gurî be, pîr be, kwîr be ... Ya girîng huner û karê keçikê ye. Loma diya keçikê dest pê dike û dibê:

- Bi navê Xwedê, keça min nanekî wusa dipijîne ku, tu sond dixwî û dibêjî qeyê nanê bajêr e. Dirûnekê dike, fena dirûna makîne ye. Piştiyekî hildigirê, bi gotinê kesek bawer nake, lê ... bi qasî barê kerekî ye.

Ji bo ku rastiya van gotinên jina xwe bipeyitîne, mêrê wê

jî:

- Rast e, dibêje, xwarinekê çêdike, meriv pêçiya xwe pê re dixwe ...

Pesindayîneke zêde, daxwaza qelendekî pir e. Ji ber vê yekê jî heta ku ji destê dê û bavê keçikê tê, pesnê wê didin. Herweha piştî pesindayîneke dûrûdirêj, keçik bi qelendekî

136

giran Û heft xelatan tê xwestin, tirş û goşt tê xwarin, keçik dibe bûk û tê derxistin.

Ev rojên pêşîn ji bo her bûkek nû bi awakî dilpekîn derbas dibe. Dilê vê bûkê jî dikire gurpegurp û di defa sîngê wê de hildavêt. Rabûn û rûniştina wê, dengkirina wê, karkirina wê, raketina wê ... bi kurtî hertiştên wê bi awakî kûvîti ye. Hîn di van rojên pêşîn de mêrê wê têderdixe ku jina wî ne ewqas xwedîhuner e. Lê ji bo ku mêrik kêleka xwe ya bi rêx ji xelkê veşêre, bêdengiyê dinuxumîne serê xwe û xwe ker dike.

Lê meriv çiqas bêdeng dibin bila bibin, ku meriv neçin mêvantiyê jî, rojekê yek ê were û li meriv bibe mêvan. Va ye ew roja jî hat. Îro hevaleyê wî ê gelekî nêzîk hatiye mala mêrik. Bi qasî ku mêrik ji hevdîtina havalê xwe xweş e, bi sê ewqasî jî nerihat e. Nebêjin çima! Lewra ku vî hevalê wî, li mala wî û bi destê diya wî xwarineke bêtam bixwara, mêrik ê tew ji vê yekê nerihet nebûya. Lê ku hevalê wî têbigêhîştta jina wî nizane xwarinek baş çêbike, wê çaxê ne dibû. Ew ê li hemberî hevalê xwe şermezar derketa. Lewra ew baş dizane ku jina wî ji heqê xwarinek xweş dernakeve. Du roj beriya îro, wê kuf tikên tije çêkiri bûn, piştî ku kuf tik di beroşê de danî bûn, agir li binê beroşê no kiri bû, heskek girti bû destê xwe û heta ku hemî kuf tik ji hev de keti bûn, beroş li hev xisti bû. Loma mêrik zûzûka radibe, xwe digêhîne mala meta xwe ya cîran û jê re:

- Metê, dibêje, hevaleyê min î gelek û gelek baş li min bûye mêvan. Ez pepûkê te me, metê! Tu bi xwe jî dizanî ku kewaniya min bi kêrî çêkirina xwarinek baş nayê. Ji kerema xwe re ji me re tiştêkî li hev bîne, an jî tu ji kewaniyê re kat bike bila ew çêbike.

Meta mêrik radibe diçe mala biraziyê xwe, dinêre ku bûka nû agir dadaye, îsot, balîcan, şamik, girar û goştê xwe dane ber xwe û dike dest pê bike. Li ser gotinên jinikê, bûka nû hinek tiştên din jî tîne û li ber xwe datîne. Jinik li ber tiştan rûdine, ji bo ku bûka nû jî hîn bibe, jê re çêkirina xwarinek xweş yek bi yek kat dike:

- Keça min, meriv berê pîvazên xwe hûr dikin û di rûn de

137

diqijilîne, tev goştê xwe ...

Bûka nû gotinên jinikê di dêv de dibire û dibê: - Ez dizanim.

Ji dilpakiya xwe, jinik çêkirina xwarinê didomîne û dibê: - Dûre meriv îsot, balkan, şamik û tiştên ...

Bi liveke zana bûka nû dîsa peyvên jinikê di devê wê de dihêle û:

- Ez dizanim, dibê.

Ji ciyê ku gotinên meta mêrik hati bû birîn, met didomîne: - Tu tiştên xwe yên mayê jî davêjî nav û di nav hev de sor ...

Bêyî ku bûk li mirûzekî pîr û tirşûtal binêre: - Ez dizanim, dibêje.

Meta reben dinêre ku ew çi dibêje, bûk peyva wê dibire û dibê: «Ez dizanim» Jinik hinekî li ber xwe jî dikeve. Lewra mîna ku gotinên wê tişteki li avarê be. Lê dîsa jî katkirina çêkirina xwarinek XWCş didomîne:

- Piştî ku te bi qasî nîv kefçiyê darîn xwê havêtê û ava wî jî berda ser, divê bi agirekî bê revî, heta çel deqeyî di xwe de ...

Bûk:

- Ez dizanim, dibêje.

Ji ber vê liva bûka nû, bêhna meta mêrik teng dibe, mîna ku bibêje, mafir ku tu hertiştî dizanî, ez çima li vir im? Her cara ku bûka nû bi bersivên weha peyva wê dibire, mîna ku wê bi xençerek zengalî birîndar bike, ewqas pê dêşe, Lê ji bo ku peyvê li ruyê bûka nû nexîne, dîsa jî li ber xwe dide û dibê:

- Herweha em hatin ser girarê. Di girarê de jî, divê tu berê rûnê xwe di beroşê de biqijilînî, dûre bi pîvan gîrara xwe di rûnê qijilandî de sor bikî, paşîngê jî li gor pîvana girara xwe, avê têxî ser û du sê caran hêdîka li hev ...

Nexweşî an jî zanebûna bûkê li vir jî pê digirê û dibêje: - Ez dizanim.

Meta mêrik êdî heta qirikê tije dibe. Çavên wê jê nabire ku gotinê xwe yên li ser girarê biqedîne. Loma zûzûka li bûka nû vedigerîne û dibê:

- Xwê ji bîr neke, xwê!.. çar hesk xwê têxe parzûnekî, devê

138

parzûn girêde, hêdîka di nav ava beroşa xwe de dayne û bila xwe bi xwe di hundurê beroşê de ...

Bûka nû û zane weke hercar vê gotina jî di devê meta mêrê xwe de dibire:

- Ez dizanim, dibêje û yek bi yek van gotinan bi cî tîne ku ji hevalê mêrê xwe re xwarineke XWeş rast bike.

139

SiNG

Ji şevan şeveke buharê bû. Ewrên reş xwe berda bûn rûyê erdê û çavan nikari bûn vatiniya xwe bikira. Ji hêlekê ve xofa ku tariya reş dixist dilê merivan û ji hêlekê ve jî, çêlî goristan û miriyên di gornan de dibû. Qalkirina gorn û miriyan jî, tirseke bêpîvan dadixist ser civatê. Şevbuhurka vê şevê, di oda gund de ev bû. Gorn û mirî. Şev li hev geriya bû, dev û lêv li civata dorê ziwa bû bûn.

Dibêjin ku mirina bizinê were diçe nanê şivên dixwe. Bi rastî ev civata jî ji xwe ne digeriya. Ji hêlekê ve tirs û xof, ji hêlekê ve jî qerf û vir ... Şertek hati bû danîn. Kê bikari bûya biçûya ser goristanê û di bersalê gornekê de singek bikûta û bi saxî vegeriya; mêrbûyîna wî ê li nava gund bihata gotin û belav bibûya.

Feqî û sofiyan bi hêrs û dengekî bilind û digotin:

- Lawo xwe gunehkar mekin! ... Ma ji bilî miriyên goristanê tiştêkî din ne ma ku hûn pê henekan bikin?

Lê li hêla din hinekan firqûziya xwe didomandin û dixwestin hinekan pîj bikin:

140

- Di vê şeva tarî de tu kesek tune ku bikari be biçê û di bersalê gomekê de singekî bikute.

- Ev kara gelekî çetin e û ne karê kurê her bavekî ye.

- Bi rastî jî kî bikari be viya bi cî bîne, di ser wî re mêr herame.

Feqî û sofiyan, ji gunehkariyê xwe ne didan ber vî tiştî û ji yên bêsewad jî tu kesek bi kêrî vî tiştî ne dihat. Ji bextreşî re, xwendekarekî navsere jî li wir bû. Bi van tiştan bawer ne dikir. Baweriya xwe ne bi tirs û xofa gom û goristanê, ne jî bi tiştên batinî dihanî. Tiqetiqa wî bû di ber xwe de dikeniya. Ji wan galegalên tewş û erzan, qet tiştêk ber bi hişê wî de ne diçû, tiştêk ne diket serê wî. Lewra, gom û goristana ku li ser dihat peyvîn, her roj ker û dewar li ser diçêriyan û di ser de dimîstin. Tew tema

wî tune bû, bi xwe têkilî vî tiştî bibe û ew jî du peyvan bike. Lê dema nêhirî ku civat di mijara ol û oldariyê de kutana singekî pir mezin û dijwar dinimîne, ew jî rabû ser xwe, pardesuyê xwe yê dirêj î xwendekariyê havête navpiyê xwe û ji civatê re got:

- Gelî civatê! Ez ê anuha biçim û singekî li ser goristanê bikutim. Lê ji bona ku hûn bê guman ji min bawer bikin, divê hûn ji min re bibêjin, ka ev singa ê di bersalê goma kê de bête kutan?

Ev xwendekarê navsere, bi rastî jî ji tirs û xofa tiştên wusa dûr bû. Pirî caran li heftûheştên wusa rast hati bû, lê bi xwe beşdar jî ne bû bû. Anuha jî li rasta oda gund, li bende singhanîna civatê bû. Pistepist keti bû nava civatê. Meriv digot qeyê ew ê welatek were xerakirin an jî şênkirin. Gelek ne buhurî ji civatê yekî, sing û mîrkutek hanî û li ber xwendekar danî. Xwendekar bê şik û bi pişirîn sing û mîrkut girt û got:

- De ka we ne got... Ez vî singa di bersalê goma kê de bikutim?

Ji firqûzên civatê yekî, zimandirêjî ji hemiyar sitend û got: - Ku tu bikari bî biçî û sing bikutî, tu dizanî ku dê û bavê min herdu jî mirine û li pişt goristanê di ber hev re dirêjkirî ne. Te kîjan divêt hema sing di bersal de bikute.

Xwendekar ji civatê veqetiya bû. Sing û mîrkut di dest de

141

Û keti bû riya goristanê. Her dever reş mîna tenî dixuya. Ji bilî pencera piçûka ku di dîwarekî oda gund de bû, tu ronahiyeke din ne dixuya. Çilkên baranê xwe hêdî hêdî berdidan xwarê. Goristan bi qasî sed werîsekî ji gund dûr bû.

Heta nîvê rê jî bi ramanên xwe yê rohnî, di şevreşiya riya goristanê de wek rêveçûnek hertimî dimeşiya. Ango tişteke ne ket bîra wî û li ser tişteke jî ne difikirî. Lê dema ku xwe gihand nîvê rê, ji nişka ve xwe bi tena serê xwe hîs kir. Ne dê, ne bav, ne heval û ne jî bîrûbaweriyên pirtûkên materyalî ... tişteke berê tirsê dilê wî ne girt û jê re ne bû paşmêrî, Di demên weha xofdar û xeternak de, hêvî ji Xwedê dibe. Wî fikir ku hebûna Xwedê bidewusîne hundurê serê xwe, li ser bifikire û bizani be ka bi rastî jî tişteke wusa heye an ne. Lê her ku ew li ser tiştên weha fikirî, asûwas li

wî çêbûn, qereqûre hatin ber çavan, tirsek mezin kete dilê wî û lerizî. Di rê de çavên xwe digirt tarî, vedikir tarî.

Xwest ku ev tirsê ha jî tirsek ji wan tirsên xewnên şevan be, lê dema di zimanê xwe de gez kir, têgêhîşt ku ne xewn e. Dilê wî digot wek hertim, ne tirs û ne jî xofa gorn û miriyan. Lê di tarî û tenêbûna şeva vê şevê de, bi kêr ne dihat; tirsê xwe di hundurê dilê wî de li hev badida. Ji bo ku tenêbûnê li xwe belav bike an jî ji xwe dûrxîne, difikand û diçû. Mixabin, ev fikandina wî jî ne jê re dibû hevlekî roja giran û ne jî dibû berkela ber dilê wî. Poşmaniyê li serê wî xisti bû, lê nikarî bû bi şûn de jî vegeriya. Heta ku jê dihat, gavên xwe fere davêt. Dixwest ku demekê zûtir ji vê tirs û xofê bifilite. Xwe bi hiş û dilekî weha gihand ber wan gornên ku hati bû gotin. Li ber bersalê yekê rûnişt, hêdîka sing û mîrkuê xwe danî ber xwe. Bêdengiyê jî xwe berdaa bû ser tariya şevê û dor lê girantir bû bû. Kund û pepûkan jî di qulikên qurmên daran de ne dixwendin ku bêdengiyê pê re li hev par bike.

Zûzûka sing serjêrî erdê kir û bi mîrkuê ji jor de lê xist.

Herçiqas kutana sing di vê rengşiliya axa goristanê de asan bûya jî, di her lêdanek mîrkuê de, mîna ku di serdilê xwe de bikute, ewqas pê dijwar dihat. Lingên wî diricifîn. Mîna ku bawî bû be, dest lê giran bû bûn.

142

Bi tirs, bi xof û tevliheviya serê xwe, bi çî awayî dibe bila bibe, lê wî ev karê ha qedandi bû. Ew ê êdî vegeriya gund. Ev vegeer ê jê re asantir bibûya. Ne ji bo ku mêraniya wî di nava gund de bête qalkirin. Na! Wî ê bi vê liva xwe, di warê ol û oldariyê de serê gelek kesan zelal bikira. Ji xwe daxwaza wî jî serwextkirina çend seriyên hişk û naşî bû. Loma vê carê jî tirs û kêfxweşiya wî li nav hev keti bû. Di rewşek wusa de hêz da xwe ku rabe û têkeve rê. Lê di rabûnê de, mîna ku çend kesan ji hundirê gornê destê xwe dirêjî dawa wî kiri bin û ber bi xwe bikêşin. Kujê pardesuyê wî bi erdê ve zeliqî bû û bernedida. Ew asûwasên ku bi gavekî berê lê çêbû bûn, anuha jê re bû bûn tiştên rastkîno û nola ku hemû miriyên goristanê lepên xwe yê hestî di wê gornê re dirêjî wî kiri bin û ber bi xwe bikêşin. Ne tirs û xofa dilê wî rê dida ku binêriya ka ew çî bû; ne jî tariya şevê dihişt bi ronahiya çavê xwe bibine ku wî ji tirsan sing daye ser kujê pardesuyê

xwe û kutaye ... Herweha li ber bersalê gornê zirav lê qetiya, bû terik û bi şûn de venegeriya oda gund.

143

TtKiLt

Ji rojan rojeke buhara şilî û şepeliyê ye. Xabûrek, bi XUşÎll diherike û anuha yahûdiyek di ber re derbas dibe. Bi qasî du sê saetan beriya nuha baran û zîpîkek wusa bariye, mîna ku ji jor de avek ji devê kunekî de bête xwarê. Çi ava xêzikokên çixurên zinaran û çi ava newalokên li berwarên çiyar, hemû jî verişiyane ser hev û li vê xabûrê xwe gihandine hev. Tev ava xabûrê bûye laserek xeternak, bi dengê xirab re qirşûqal û darûber daye pêşiya xwe û diherike.

Bi xurmexurma dengê laserê re qêrîn û hewarek tê bihîstin. Piştî çend dangan, yahûdî dibeze ser kevîrekî kendalê xabûrê û li laserê temaşe dike. Dinêre ku di nava laserê de merivek serûbinî hev dibe û dike ku bixeniqe. Dengê hewar û qêrîna wî dilê merivan diperitîne.

- Hewar!.. Hewar! Ma ... ma bisilmanekî Xwedê tune ye, hewar! ..

Yahûdî yekî nake dudu. Tabilê xwe digêhîne darekî dirêj, bi lez diçe ber kendalê xabûrê û dar dirêjî mêrik dike. Bi alîkariya yahûdî, mêrik ji mirinê difilite. Yahûdî agirekî jî dadi-

144

de, wî li ber ziwa dike, cixarekî dipêçe û dirêjî wî dike. Êdî ne tirsî mirinê û ne jî serma û şilî ye. Bêhn tê ber mêrik, herdu destê xwe ber bi jor radike, piştî ku lavelavekê ji Xwedê dike, vedigere ser yahûdî û jê re dibê:

- Xwedê û pêxember ji te xweş be! Bi rastî ku te jî xwe ne-gîhanda hewara min, ez ê çem û çem biçûyama.

Dûre dest bi pirsînên havdu dikan. Kî ne, çi ne, ji kuderê ne... piştî ku pirsên weha li hev dikan, ew î ku ji nav laserê derketî, têdigêhîje ku ew î li hemberî wî yahûdî ye. Herçiqas ji bo ew î yahûdî pir ne girîng e ku yê hember ji kîjan olê ye, lê gwînê ew î hember divemire, mirûzê wî tirş dibe û di ber xwe de bi çavekî xirab li yahûdî dinêre. Heta demeke kurt jî her bi ramanên xirab e. Difikire, difikire lê tiştê ji hev dernaxîne. Lewra mîhrebanî û dilovaniya yahûdî ne tiştê xirab e, lê yahûdîbûyîna WI"?. A ew ji bo wî ne tiştê hêja bû. Lewra neyarê ola Mihemed e. Xweş xuya

dibe ku ew kuştina yahûdî difikire. Bi ramanên serê xwe jî namîne û radibe rasterast ji yahûdî re dibêje:

- Ya ciwamêrê Xwedê! Tu bi xwe jî dizanî ku di ola me de, di bisilmaniyê de kuştina yahûdiyekî helal û tiştêkî pêwîst e. Ku tu anuha bisilmaniyê bihewînî, erê ... lê ku tu nekî, wê çaxê divê ez te bikujim.

Yahûdî xwe bi xwîna mêrekî davêje bextê wî, diçe dest û lingên wî, li ber digere û jê re dibêje:

- Ez bi gorî! .. Ma ... min ji bo kuştina xwe tu ji avê filitandî?

- B3ş e, ku tu li kuştina xwe nagerî, wê çaxê eşheda xwe bi navê Mihemed bîne û bibe bisilman.

- Ezbenî, ma çi dibe ku ez li ser ola xwe bim? Ma anuha xirabiyek yahûdîbûyîna min li te dibe?

- Belê belê, dibe! Lewra ola me wî tiştî nahewîne. Îcar ku ez te nekujim, ez ê bibim yekî wek te.

- Binêre, ezbenî, ku te bivê em dikarin tavilê ji hev biqetin, bila çavên me li hev nekeve, û herweha tu jî li gor xwe gunehkar nebe.

- Nabe, nabe! Lewra carekê çavê min li te ketiye.

145

- Malava! Ma pir ne ma bû ku tu bixeniqiyayî. Û tu bi xwe jî dizanî ku min tu ji mirinê xelas kirî. Tu ê çawa rabî vê bêbextiyê li min bila"?!

- Ma min çi dizanî bû ku yahûdiyekî nola te tê min xelas dike? Bila ez bixeniqiyama, çêtir bû.

Yahûdî dîsa dest bi bergerînê dike û dibê:

- Bavê min, kalê min, roniya herdu çavên min ... binêre, ma anuha çiyê min û te li ber hev heye ku em nikarin li hev par bikin?

- Yahûdî! .. ew neyarên ola me ne.

- Binêre, ezbenî. Em jî û hûn jî. .. em hemû jî li ser riya Xwedê ne. Lê di bîrûbaweriyê de cewazî, an jî cudaiyê me î piçûk heye. Ev cewaziya jî, ji xwe kevn bûye. Min bi xwe jî ji bîra kiriye êdî.

Yê bisilman xwe li ber yahûdî tirş û tûj dike û bi hêrs dibêje:

- Ku te ji bîr kiri be jî, bila anuha bête bîra te ku ... ku em neyarên hev in.

Yahûdî dike nake, nikare xwe ji destê bisilmên pak bike.

Lê ji bo ku hinekî hêrsa wî ya mezin daxîne, vedigere ser û jê re dibêje:

- Baş e, ma gunehkariya min çi ye? Te hewar kir, ez jî di hewara te de hatim. Ku te heqî û neheqiyê divêt, wê çaxê em biçin ba ciwamêrekî û bila ew binêre ka kî ji me neheq e.

Li ser vê yekê bisilman û yahûdî li hev dikin û diçin. Di rê de biryarekê jî distînin ku ew kesî ku ev ê biçin cem, ne yahûdî û ne jî bisilman be. Rasterast diçin ba zerduştîyekî. Piştî ku ev yên ha bûyera xwe ji zerduştî re kat dikin, ew î zerduştî jî çîrokê fahm dike û ji wan re dibêje:

- Ji bo ku ez biryareke baş û rast bidim, ew ciyê ku hûn li wir rastî hev hatine, divê ez bibînim ... bibînim ka bûyer çawa bûye.

Li ser vê yekê; bisilman, yahûdî û ew î zerduştî didine pey hev, diçin ber xabûrê û wî ciyê ku bûyer qewumî bû. Herika laserê hîna wekî xwe î berê ye. Zerduştî dirame, rengê zaniyarekî dide xwe, dûre dizivire ser wan û dibê:

146

- Ji bo ku ez biryareke baştir û rastir bidim, divê hûn her yek biçin ciyê xwe ... ciyê ku te (bisilman) hewar dikir, û tu jî (yahûdî) ciyê ku te dengê hewarê bihîst.

Zerduştî jî diçe ser kevirekî ber devê xabûrê, ew î yahûdî diçe ser rê û mîna berê hêdî hêdî di rê de dimeşe. Ew î bisilman jî hinekî diçe jor û ji wir de xwe davêje nava lasera xabûrê û laser wî dîsa serûbinî hev dike. Carekê duduyan hewar dike, lê dinêre ku ew î yahûdî dereng ma. Nola berê zû di hewara wî de nayê. Li ser vê yekê tirsî mirinê li bisilmên zêdetir dibe û vê carê ji kezebeke şewutî hewar dike.

Bi vî dengê hewarê re, ew î yahûdî dîsa zûzûka xwe digêbîne darekî dirêj ku di hewara bisilman de biçê. Lê zerduştî tavilê xwe ji kevir de davêje xwarê, diçe pêşiyê li yahûdî digirê û dibê:

- Ku tu naxwazî hinek ji te re bibine serêş, an jî tu ji hinekan re bibî zikêş ... divê têkilî tune be.

Dengê hewara ew î bisilman di nava xurmexurma dengê laserê de nizm dibe û her ku diçe ew dengê hewara ji kezebê wenda dibe.

147

PEYVEKE RAST

Rûniştevanên li gundan, her karekî xwe di demekê de û bi hev re dest pê dikin. Serqisê: Dirûna giyê, pa1iya tenan, kutana bêderan, quraftina garisan, birîna çilo û hwd ...

Dema ku kelandina rezan an jî kişandina gidişan tê, hemî gundî li oda gund, an jî li mala Xwedê li hev dicivin û li vir biryara destpêkirinê distînin. Pirtirînê biryar û civînên weha jî di rojên îniyan de dibin. Gundiyên ku bizani be karê wî ê bi refê gundiyan re neqede, wê çaxê bi alîkariya devşûgiya derûcîranan serastiya vî tiştî dike.

Di gundekî weha de gundiyeke teral heye. Li ser biryarên destpêkirina kar, tu wextekê jî bi gundiyan re hemfikir ne bûye. Dema ku gundiyan çêlî zerbûna nîsk û nokan bikira, an jî quraftina garisan ji xwe re bikirana mijara axaftina mizgeftê, ev gundiyeke teral ê li hemberî wan bisekîniya û bigota:

- Garis hîna kal e, tirî hersim e, nîsk û nok hîn şîr e!

Ji rojan rojêke îne ye. Gundî çêlî pa1iya tenan dikin. Dix-wazin piştî hefteke din, dest bi pa1iyên xwe bikin. Gundiyê teral van hemî gotinên gundiyan dibihîse. Xwîdaneke sar li

148

eniya wî dide der û dilê wî wek aşekî xirabe dike gurpegurp. Herçendî rojên îniyan rojên xêr û başiyê bin jî, ji bo vî gundiyeke teral ne wusa ye. Di rojên weha de hêrsa wî lê radibe û bêhna wî teng dibe. Lewra biryarên destpêkên kar, hertim di van rojan de tene girtin. Lê dîsa jî li ber xwe dide. Bi piyêkî xwe xwîdana ser eniya xwe paqij dike û piyên xwe î din jî bilind dike û dibê:

- Bi serê min û we ... Bi vê roja pîrozwer, tene hîna kal e ... ku em bi kalî

...

Ji ber ku gundiyan di berê de rewşa vî gundiyeke xwe dizani bûn, tew guhê xwe nadin wî. Lê gundiyeke teral her li ber xwe dide û dibê:

- Bi navê Xwedê ku hûn wusa bikin, ew ê îsal xela li me dakeve. Ma we dîtiye ku kesekî paliya tenên şîr û kal kiriye? Hûn dinênedî ne, çi ne! Meriv çima bi destê xwe xelayê li xwe daxîne!

Lê em baş têdigêhîje ku ji gundiyan naşiyekî herî kêmaqil jî guhdariya wî nake û ew ê gundî têkevin paliyan. Ji tirsê kar, giyan li gundiyeke teral

ditevize, dest û ling lê dilerize, ta pê digire û dikeve nava nivînan. Piştî çend rojan dema ku ji nava cilan radibe, dinêre ku kesek di nava gund de ne maye. Gundiyê teral derdikeve ser banê xwe û li nava zeviyên hawirdorî gund dinêre. xuştîna gundiyan e, di nava erdên xwe de bi qalûç û kêlendûran paliyên xwe dikin.

Ji nişka ve tiştêk tê hişê wî. Ew jî nizane bê çima. Lê tavalê ji ser xênî dadikeve xwarê, radihêje qalûça xwe û berê xwe dide ser erdê xwe. Bi bejnûbala xwe ya bilind û qalûçeke devgir, gavên xwe fere davêje û hinekî jî bi hêrs e. Yekî ku pê nizani bûya, ew ê bigota, ev meriv ê ha dikare paliya erdekî di danekî de biqedîne.

Gundiyê teral xwe digêhîne erdê xwe. Ji serê yek heta kujê din weha carekê çavekî lê digerîne. Pûşê gênim êdî hişk bûye. Teral jî dizane ku paliya gênim di kewna xwe de ye. Lê çavên tirsîyayî naxwaze devê qalûçê li qevda paliyê bikeve. Gundiyê teral careke din çavê xwe li erdê xwe digerîne, bi pîvana çavan dike sê perçan û xwe bi xwe dibê:

149

- Ev perçe ji bo sibê ... ev perçê din ji bo dusibê ... û ew perçê ha jî ji bo sêsibê ... Herweha paliya min ya ku ez îro bikim tune ye.

Teralê ku dibîne paliya wî ya wê rojê tune ye, bêyî ku qalûçê li qevdekê bixîne, vedigere mala xwe. Sibê dîsa dikeve riya erdê xwe û bi wê qalûça xwe ya devgir ber bi paliya xwe diçe. Lê dema ku xwe digêhîne ser paliyê, çavên tirsonek dîsa naxwaze dest bi paliyê bike. Tenê dikari bû tiştêk bikira û ew jî tenê wî tî dîke. Ango dîsa paliya xwe dike sê beşên mezin; li sibê, dusibê û sêsibê par dike û vedigere malê. Herweha qalûça gundiya teral di dest de û gelek rojan di riya paliya xwe de diçe û tê.

Her cara ku gundiya teral rewşa paliya wî jê dipirse, ew jî weha bersivê dide:

- Paliya sê rojan e.

Roj tîn û dibuhurin. Hemî gundiyan paliyên xwe qedandine û dest bi kişandina gidişên xwe kirine. Lê paliya gundiya teral hîna li dar e, her diçe li sê rojên pêş par dike û tê malê. Naxirên dewaran û colên pezan li pirêzan rast dibin. Her cara pez û dewarên ku di ber erdê wî re derbas dibin, bi qasî du werîsan paliya wî li erdê radixin.

Hew rojekê dibîne ku paliya wî ya li dar, di nava lingên pez û dewaran de bû ka û çû. Êdî ne tê qevdê û ne jî bi kêrî tişteki tê. Herweha ew jî û hersê rojên pêş jî ji paliya genim pak dibe.

Ya rastî gundiye teral ji vê yekê kêfxweş dibe. Ji ber ku êdî pirsê paliyê ji serê wî derdikeve, xewn û xewa xwe ya şêrîn di ber tişteki weha de naherimîne. Anuha di riya mala xwe de lotikan dide xwe û diçe. Mîna ku paliya wî ne ma be, tew xwe qure dike û difîkîne jî.

Dema tê nêzîkiya gund, ji bo ku solên wî şil nebe dike ku xwe di ser newala piçûk re çen bike. Wusa jî dike. Lê dema ku xwe di ser newalê re hildifirîne hêla din, ji şeytanî re ba bi ber dikeve û dengê ehmeqane li kerika guhê wî dikeve. Di wê gavê de xwîdaneke sar û germ, mirûzekî tirşûtal, û perdeyê şermezariyê mîna şeltekek qirêj berê çavên wî digirê.

150

Mîna ku hemî gundiyan ev tira wî bihîsti bin, ji şermezariyê heta gavekê jî serê xwe ji ber xwe ranekê û li dora xwe nanêhire.

Ji wî wetrê hinek kes ê li dora wî hebin û wan ev dengê tira wî bihîsti bin.

Loma ji bo ku zêdetir şerm neke, an jî yên ku bihîsti bin li wî negirên:

- Ax, dibêje, ku ez yê berê bûyama!

Dûre hêdî hêdî serê xwe ji ber xwe radike, li hawirdora xwe dinêre ku tu kes li wan derina tune. Wê çaxê nola ku li xwe mikûr were, bi pişirîn di ber xwe de:

- Ero weUe, ez berê jî ev gûyê ha bûm, dibêje û ber bi mala xwe diçe.

151

XEYALÎNA

Merivekî xizan e. Û ev xizaniya wî jî ne bes ji bo salekê ye.

Meriv dikare bibêje ku hersal di tunebûnê de dijî. Ji destengiya wî, xelkêdî zikat û fitrên xwe didine wî. Ev neçariya wî, digêhîje dereke wusa ku debara xwe ya rojane jî, bi şîvên miriyên(*) xelkê dike. Mêrik tu rêyekî tê dernaxîne ku ji bo rojên pêş û tengtir, ji xwe re sermiyanekî bide hev. Lewra ji gêrmî û kuftikên derûcîranan, ne sermiyan rast dibe û ne jî soxê kuftikan dibe sitara rojên giran.

Dîsa ji şevan şevêk îne ye. Derûcîranên wî şîva miriyên xwe derdixin, ji mêrikê xizan re xwarin û pêxwariniyê tînin. Lê vê carê di nav şîvên miriyan de, hinek şîr jî jê re tê. Mêrikê xizan difikire ku kuftik û girara şîva miriyan nayên firotin.

(*) Şîva miriya: Xwarin an pêxwariniya ku xelk şevên îniyan ji bo miriyên xwe derdixin. Ku xwarina wan wê şevê çî be, bi qasî xwarina merivekî didin xizan, sêwî, kal û pîrên bêkes. Ev jî vatiniyeke olî ye. WW

152

Lê dikare ji wî şîrê ku jî re hatiye, mast eyvan bike û bibe bifiroşe.

Û mêrik wusa jî dike. Lê serê tunebûnê bixwe! Elba wî jî tune ye da ku şîrê xwe tê de eyvan bike. Xwedê merivan ji de-rûcîranên baş ne ke! Rebeno bi lez û bez bi derê cîranan dikeve û kuroçek elbik bi dest xwe dixîne. Şîrê ku jê re hatiye, germ û eyvan dike, bi xilm û xeyala jiyana xwe ya pêş, dikeve nava şeltikên xwe.

Dikeve nava nivînan lê bêhna xewê nakeve çavên wî. Ne em û ne jî ew pê dizane ku ew kengî ketiye xewê. Lê heta vê xewa xwe; dinê şên kiriye, rûxandiye, ji nû ve ava kiriye, cardin hilşandiye û dîsa çêkiriye ... herweha ketiye xeweke giran.

Mêrikê xizan bi dengê dîkên berbanga sibê re şiyar dibe.

Elbika mastê xwe dixê destê xwe, dikeve rê û berê xwe dide bajêr. Ji hêlekê ve dengê teyr û tilûlên hênikayiya sibê û ji hêlekê ve jî, jiyana wî ya rojên pêş, wî dixîne nava ramanên kwîr. Ji ber ku riya bajêr dûr e, elbika mastê xwe dide ser serê xwe, di rê de dikeve nava dola xeyalên xwe û histêrik di gerdûna xwe de pê dipişirin,

«Ez ê bibim bajêr bifroşim. Ku min bi şiqasî firot, ez ê pê hêkan bikirim û bînim malê. Ez ê qurpekê jî ji cîranan bixwazim. (Lewra neçarekî wusa ye ku mirîşkek jî li hewşa wî tune ye.) Û wan ... wan hêkên xwe bidim bin qurpê. Ez ê piştî mehekê bibim xwediyê birek çivik. Her çiqas ew ê ji wan çivikan, çend liban pisik û kûçik bixwin û çend libên wan jî zarokên nerind bikujin; lê ew ê dîsa jî çendek ji wan bimînin. Û ew ê vê payîzê bibin mirîşkên hêkan.

Ku ev mirîşkên ha hemî hêkan bikin, di rojekê de evqas hêk dike; di mehekê de evqas û di şeş mehan de jî dibe evqas ... Cotek hêk evqas be,

di salekê de evqas pere ê bi dest min bikeve û ez ê pê du golikên sawa bikirim. Du salan jî wan xwedî bikim; golik, parone, nogin ... û êdî mange ne ... Sala ku were jî, ji her yekê wan golikek çêdibe. Ê ez êdî xwediyê çar serî dewar û çend mirîşkên anaj im,

Piştî çend salan ez ê ji hêk û qatixên wan ber xwe bibînim.

Ku min (Ul: êdî dewlemendiya min berbihev tê, ez ê wê çaxê

153

dest bi kirîna colek pez bikim. Paşîngê ez ê ji xwe re traktorekî û çend pîne zevî bikirim. Bi xwe bajom û bi xwe biçinim ... Piştî ku dewlemendiya min ciyê xwe girt, ez ê ji xwe re apartûmanekê jî bidim avakirin. Ê dora wê jî ji her babetî kulîlkên çînî, ûrisî û arnawûtî bixemilînim ... »

Mêrikê xizan di xeyalên xwe de bûye dewlemend û di dewlemendiya xwe de li van deran e. Lê anuha elba mêt li ser serê wî ye û nêzîkî li bajêr kiriye. Dinê êdî lê zelal bûye. Teyr û tilûl, mar û mişkên çolê ji hêlînên xwe li derketinê ne. Hindik maye ku ro tîrêjên xwe bide berwarên mitên çîyan. Mêrik dev ji van xeyalên xwe î xweş bernade. Lewra çavên wî li dewlemendiyeke zêdetir e, loma xeyalên wî yên bêbinî jî her didome. Anuha Elba mastê wî hîna li ser serê wî, çavên wî vekirî, xeyalên xwe li du hev rêz dike:

«Ê ... paşîngê jî divê ez bizewucim. Ji xwe ji bo min ya herî girîng jî eve, û ev zewaca min divê bi yeke bajarî ve be: Porê wê tanqo, lêvên wê boyaxkirî, fîstanê wê kurt be. Lewra dema li ser sandaliyê rûne, divê çîpên wê yên rût û bêpûrt ji min ve xuya bikin. Ku wusa nebe, ew ê bi kêrî vê dewlemendiya min neyê ... »

Mêrik heta vir dizane ku ev hemû xeyal in û ji xwe re li ser jîyanek baş difikire, Lê ji vê gavê û pêve, mêrik bi rastî jî xwe wenda dike. Ji wî wetrê ew bi xwe jî di nava wê jîyanê de dijî û didomîne:

Xanima min papor vexistiye, çaydanê me li ser, ava me li kelê ye. Me çaya xwe jî havêtê û da ragirtinê. Jina min ya tanqo û fistankurt, du kasikên çayê daniye ser sêniyekê û bi rûkenî ber bi min tê. Giran giran kasikan tije çay dike, dide ser destên xwe yên nerm û ber bi min tê. Soraviya rengê çayê mîna yê lêvên wê, germiya dilê min fena ya çayê ... Hey hewara te X wedêyî .. ! Bi livek giramgîr û bi hezek jidil ji min re dibê:

- Kerem bike, ezbenî.

Ez jî kerema xwe lê vedigerînim û:

- Na xanim, berê tu kerem bike, dibêjim.

Li ber çavên mêrik, jinik ji kêfxweşî û dilşadî carek din jê

154

re dibêje:

- Nabe ezbenî, divê tu berê kerem bikî.

- Qet nabe, bi navê Xwedê divê tu berê kerem bikî, xatûn!

- Wele ez berê ranahêjim, divê tu pêşî kerem bikî. Ma ez
ê ...

Mêrik vê carê, serê xwe jî bi mebesta «Wusa, qet û qet nabe» de, bi paş
de dike û dibêje:

- Na xanim! Ez di jiyana xwe de hîna nû gîhame dilxweşî û bextîyariya
xwe. Êdî qet tiştek ne maye ku ji dilê min re bibe daxwaz. Di tevayiya
jiyana xwe de, min her ji bo vê roja ha serê xwe dêşand, Ji vir û weha dinê
bi min XWeş e û ez ê ji hemî merivan hez bikim. Ew meriva ku ez ê pir û
pir jê hez bikim jî tu î. Bibêje! Bibêje xanima min, bibêje! Ez şên bikim, ez
hilweşînim? Bibê ... bibê! Te çi ji min divêt, bibê! Ez ji dinê, ji jiyane ... Ez
ji te hez dikim!...»

Mêrik herwekî ku li ser sandaliyê rûniştiye, piyên xwe bilind dike, xwe ji
hev vedikîne û bawîşkên xewa sibê dikêşîne ...

Di vê navberê de perda xeyalan xwe ji ber pîpikên çavê wî weke pêlên
avek rawestî dide alî. Li xwe divarqile ku royê tîrêjên xwe sipartine palên
çiyayên hember û ew jî hîna di riya bajêr de ye.

Nêzîkî lê kiriye, lê xwe ne gihandiye bajêr. Rebeno di ciyê xwe de sipûsar
dibe. Xwezî di ber de dimîne, bi gwînekî vemirî gewriya wî teng dibe,
bêhna wî nayê der. Bi xwe jî nizane ku çi lê qewumiye.

Dewlemendiya ku wî bi xeyalan bi dest xwe xisti bû, anuha mîna kevotekê
ji dest firiya bû. Mîna ku jiyane pê henekê xwe kiri bû. Elbika mêt jî ji ser
serê wî de keti bû. çûyîna bajêr êdî bêtê bû.

Loma bi rewşeke bêhêvî bi şûn de vedigere. Di rê de, li ciyekê dinêre ku
elbika mastê wî derxûm ketiye û mîna yekî nexweş mast verişiyaye.

Bi qasî demeke kurt weha bêdeng li elbika xwe ya derx-ûmketî dinêre, li paş xwe dizivire, li bajêr dimeyize û dûre xwe bi xwe dibê:

- Elba vala, bi kuftik û firên şîrê xelkê tije nabe ... ev jiyana

155

li ber deriyan ...

Kelagirî li gewriya mêrik dipiçike û wek dewlemendekî ku di lîstikekê de hemî dewlemendiya xwe wenda kiri be, di ramanên xwe de digirî û digirî.

156

XULAM

Rêwiyekî riyeke dûrûdirêj ketiye rê û diçe. Li derekê ro lê diçe ava, dinê li tarîbûnê ye. Divê ew li wan derina xwe bi şev û şîv bike û sibê li xwe bîne. Ji dût ve gundek dixuye. Bêhna nanê şewutî, bêhna tirş û girarê bi pêlên bayê jorîn re li bêvila wî dixê. Biryara xwe dide û xwe li bêhna nanê şewutî digire û ber bi jor diherike. Piştî nîv saetekê nêzîkiyê li gund dike. Zirîna keran, ewtîna kûçikan tev li qêrîn û wajîna zarokan dibe û tîn li guhên wî dikevin.

Dema xwe digihîne ber malan, ji xortekî mala mezinê gund dipirse û dûre diçe qonaxa mîrê wir. Li dêrî dixê, derbasî jor dibe, ew û mîr silavê li hev hildidin, li hev dipirsin û dûre mîr jî xwe pê dide naskirin.

Sê xulamên mîr hene. Hersê jî xerîkî rastkirina xwarinê ne. Lê li vir rewşa van xulaman gelekî bala rêwî dikişîne. Hersê jî xulam in. Lê neliheviyeke dîyar di nav wan de heye. Ku yekî ji dût ve jî bala xwe bidana wan, ew ê ev cewaziya di navbera wan de, ji cil û bergên wan jî derxista. Rêwî bi qasekî di-

157

keve xewn û xeyalên van cewaziyên xulamên mîr. Yê yekî; ser û guhên wî paqij, cil û bergên wî nû û baş e. Yê din, dîsa parîkî baş e. Lê kincên ku li yê sisiyan e, bi tevayî ji cil û bergên xulamên din cuda ne. Ev hîna ji derve de wusa xuyaye, lê tew nuha maf û têtikiliyên wî, rûmeta Wî? Heta ku textê xwarinê amade dibe, xwarin tê xwarin û kahwe jî tê, rêwî her bi van pirsên serê xwe mijûl e.

Dema ku mîr dibîne mêvanê wî bi raman e, û her difikire, parîkî li xwe digirê. Çiqas ne be jî, mîrê navçeyekî ye. Vê carê jî mîr bi xwe dikeve nava

ramanên tevlihev. «Aya ev nanê ku rêwî li mala min xwar, ne bi dilê wî bû? An li mala mîrekî nola min nan têr ne xwar, çi ye?» Rêwî hay ji van asûwasên mîr tune. Lê mîrtiya mîr pê digire û ji rêwî dipirse:

- Mêvano! Tu çima ewqas bi raman î? Tiştêk bi serê te de hatiye? .. An te ji hêla tevger û xwarina me de kêmasiyêke me dît? ..

Rêwî serê xwe hêdî hêdî radike, dîsa li pergala xulaman dinêre û bi pişirîneke nerm:

- Na ezbenî, na welle mîrê min. Bi nanê mala mîrê min, ez qet ji bo xwarin û tiştêkî din ne ... û xwarin jî ji serê min zêdetir bû. Lê ...

Mîr galegalên wî dibire: - Lê çi? ..

Diviya bû rêwî êdî çîroka fikirkirina xwe ji mîr re vekira û pê ew sewext bikira. An ne, mîr ê gelekî xirab bifikirîya. Ji ber vê sedemê jî radibe hemî kul û kesera dilê xwe weha vedike:

- Mîrê min, ev hersê jî xulamê te ne. Xulamî her xulamî ye. Lê mîna ku tu jî dibînî: ji hêla cil û bergan de cewaziyêke berbiçav di navbera xulamên te de heye. Ê ez wer bawer dikim ku ev cewaziya ê di qedir û rûmetê de jî hebe. A ji bo vê yekê ye ku ez weha kwîr kwîr difikirim. Lewra ji xulamên te, yek bi kincên nû û paqij e, li yê din çê-xirab ... û kincên ku li rê din jî pertilî û qetyayî ... Ma cudayiya xulaman çi ye?

Li ser vê yekê mîr dibêje:

- Tu xwe ragirê û bêhna xwe fere bike, ez ê dûre ji te re

l58

bibêjim.

Kahwe tê vexwarin, di ber re jî çîrok û dîrokên civatên malmezinan têne gotin. Di vê navberê de dengê ewtîna kûçikan ji jêra gund heta oda mîr bilind dibe. Mîr li ciyê xwe, ber bi pencera vekirî dinêre, dûre li rêwî dizivire û dibê:

- Tu nuha baş guhdar bike.

Rêwî bi bal guhdar dike û bi mereqdarî dipê ku ew ê çi bibe. Mîr bi xwe jî li pêş wî rûdine, pala xwe dide balivê û gavekî bêdeng dimîne. Rêwî hêj guhdar dike. Mîr bi dengê bilind banî xulamê xwe î herî rewşxirab dike û li hafa rêwî jê re dibêje:

- Ca biçê bê ew kûçikên gund ji bo çi direyin.

Rêwiyê mêvan jî bi balli mîr û xulamê wî temaşe dike û her guhdariya wan dike.

Xulamê rewşxirab diçe û piştî bîstekî vedigere nik mîrê xwe û rêwî. Tiştê ku xulam ji mîrê xwe re kat dike, eve:

- Mîrê min, dibêje, ew karwanekî biyanî ye. Loma kûçik direyin.

Mîr di bin çavan re li rêwî dinêre û ji xulamê xwe re: - Baş e, dibêje, êdî biçe.

Mîr wî dişîne xwarê û ji rêwî tika dike ku baş bala xwe bide ser û guhdarî bike. Dûre ban xulamê xwe î duduyan dike û ji wî jî dixwaze bizani be ka kûçikên gund çima direyin. Ev xulamê duduyan jî bi lez ber bi jêra gund dibeze. Di vê navberê de baldarî û guhdarkirina rêwî lê zêdetir dibe. Piştî demeke kurt, ev xulamê navîn jî vedigere hafa mîrê xwe û:

- Mîrê min, dibêje, karwanê welatên rojhelat in. Derbas dibin û ber bi welatên rojava diçin. Nîsk û nokên firotanê dibin.

Mîr wî jî dişîne xwarê û ban xulamê xwe î rewşbaş dike.

Mîna xulamên xwe yê din, dixwaze bila ew jî biçe û binêre ka ew kûçikên gund çima direyin. Bi vê daxwaza mîr re, xulam bi bayê bezê diçe û avê li ser xwe zelal dike. Piştî demekê ew jî vedigere hafa mîr û jê re qala sedemên ewtîna kûçikan dike:

- Mîrê min, karwanekî welatên rojhilat di rê de derbas di-

159

bin, loma. Barê karwên nîsk û nok e û ber bi welatên rojava diçe. Li gor gotina serkarwan, ev çel roj in ku di rê de ne û ew ê hîn bi qasî deh rojên din jî di rê de bin. Karwan bi xwe, ji wexta xwe dereng ketiye. Diviya bû bi sê rojan berî îro xwe gihandi bûya ciyê xwe. Lê dema karwan xwe gîhandiye, Çiyayê Bênav, li wir li rastî serpêhatineke nepayî hatiye û loma ... Û dîsa li gor gotina serkarwan, ev bûyera ku hatiye serê wan jî weha bûye: Dema ku ...

Mîr peyvên wî dibire û wî jî dişîne xwarê. Dûre li rêwî dizivire û dibê:

- Belê mêvanê min î delal! Ez nizanim bê tu anuha têgê-

• • ~ A ?

hiştî, an ne ...

160

ZANA Û KURt wî

Merivekî, bi zaniyarî, şêwirmendî û aqilmendiya xwe, di navçeyê xwe de navûdengê mezî daye. Xwe bi gelê vî nav-çeyî daye hezkirin. Ji ber vê yekê jî xelkê navçe, qedrê wî dizane û rûmetê didine wî. Ku xirabiyek têkeve navîna du kesan, rasterast têne ba wî, giliyên xwe bi wî de dîkin û bi wî dişêwirin. Ew jî bi aqilmendiya xwe wê dozê safî dike û wan kesan bi aşîtî dişîne. Ku ji kê re bigota çî, ew gotina wî ne dîkirin dudu û bi ya wî dîkirin. Rewş digêhîje dereke wusa ku; dîn û baqil, jin û mêr bi dozên xwe têne ba wî û giliyê xwe pê de dîkin. Bi kurtî yê ku bi pevçûn têne ba wî, bi xweşî ji ba wî diçin.

Rojekê dîsa du kes têne mala wî ku giliyên hevdu bikin.

Lê wê rojê jî ew bi xwe na li mal e. Ji dêla wî ve kurê wî banî wan kesan dike ku doza wan ji hev safî bike. Heta wê rojê jî, kurê wî di dewsa wî de li dozekê jî ne nêhiriye û tu dozek safî ne kiriye. Ango ev cara pêşîne ku kurik xwe dixê bin berpirsiyariyeke weha. Lê kurik bi xwe jî li ber destê bavê xwe, bi kêmanî bi qasî wî bûye xwedîzan û pisporekî vî karî.

161

Kurik banî van herdu kesan dike, derdixê oda jorîn, guhdariya gilî û gaziñên wan dike, çê-xirab wan li hev tîne û bi xweşî wan bi rê dike.

Dûre bavê kurik tê û bi vê bûyerê dihesê. Zana ji hêlekê ve kêfxweş bûye ku kurê wî jî êdî dikare dozên xelkê safî bike, û ji hêla din ve jî, ji vê tevgera lawê xwe nerihet dibe. Lewra ku kurik tiştê nebaş kiri bûya, ew ê bibûya sedema têkçûyîna navûdengê wî. Zana li ser vê tevgera lawê xwe gelekî dirame, dûre di tiştê de serê xwe zelal. dike. Tiştê ku kurê wî kiri bû, xirabiya wê ji başiya wê girantir bû. Ji ber vê yekê jî pir nerihat dibe, radibe banî kurê xwe dike û bi hêrs jê re dibêje:

- Tu çîma di dewsa min de û bi navê min têkilî gilî û gaziñên xelkê dibî? Ma tu nizanî ku ... ku tu çewtiyekê bikî, ew ê têkeve ber navûdengê min? Ez ê dûre çî xweliyê li serê xwe bikim!.. Tu çîma wusa dilo"? Te çîma wusa kir?.

Kurik bi livek ewle dibê:

- Ez jî êdî hîn bûme, bavo. Erê, hîna navûdeng bi pey min ne ketiye, lê ...
lê ez jî êdî dizanim bê meriv bi çi awayî dikare ...

Bi bîhîstina van gotinê kurê xwe, zana gelekî hêrs dibe, peyvên wî di devê
wî de dihêle û dibê:

- Bllş el Ez ê anuha sê pirsan ji te bikim. Ku tu rast bibersivînî, wê çaxê te
baş kiriye û ji vir û weha jî di dewsa min de tu guhdariya gilî û gazinên
xelkê bike, tu safî bike ... Lê ku tu bersivên çewt û dûrî aqilan bidî, ez ê
devê şûr bavêjim hustuyê te.

Zana van tiştên ha ji dil dibêje. Ku kurê wî bersivên rast û baqilane nede,
ji bo navûdengê xwe be jî, ew ê şûr bavêje hustuyê lawê xwe. Zana şûrê
xwe ji kalan dikêşe, dide ser çogên xwe û dest bi pirsên xwe dike:

- Ev pirs a yekem e: Ku yekî dîn û yekî baqil werin ba te, gilî û gazinên xwe
bi te de bikin, tu ê çi bikî û wan çawa li hev bîm"?

Kurik li pêş bavê xwe çog dane erdê, herdu destên xwe dane ser hev, li
hemberî vê pirs a yekemîn, beriya ku deng jê

162

derkeve hinekî dirame, dûre li bavê xwe î zana dinêre û weha dibersivîne:

- Berê, ez ê ew î baqil neheq derxînim û dûre ez ê hêdî hêdî têbigêhîjim
ka doza wan çi ye, çawa qewumiye. Ji ber ku ew î baqil ne neheq be jî, ew
ê bikari be heta dawiyê guhdariya min bike. Piştî ez baş têngêhiştim ku doz
çi ye û çawa qewumiye, wê çaxê ez ê riyeke baş bidime ber wan û wan li
hev bînim.

Xuyaye ku zana ji vê bersiva kurê xwe kêfxweş bûye.

Loma «Baş e» dibêje û didomîne:

- Pirs a duyemîn: Ku du kesên dîn werin ba te û herdu jî bi gilî û gazin bin,
tu ê çawa safî bilo"?

Kurik dîsa bi rewşeke ewle, berê di ber xwe de hinekî difikire, dûre
vedigere ser bavê xwe û dibê:

- Beriya hertiştî divê ez bizani bim ku herdu jî dîn in. Ji ber vê yekê ew ê
tew wexta peyivînê ne bidine min ku ez guhdariya wan bikim û ne jî ew
riya axaftinê bidine hevdu. Di gava pêşîn de her yek ê ji xwe re bike birebir
û ew î hemberî xwe neheq derxîne. Ne dûrî aqilan e ku li ba min jî
pevçûnekê derxînin. Lewra dîn in. Loma ... loma divê ez pêşiyê wan

herduyan jî baş girêdim û wan ço bikim. Wusa li wan bidim, wusa li wan bidim ku herdu jî bibêjin, «Neheq ez im!» Dûre ez ê banî wan bikim, guhdariya wan bikim û binêrim ka çima ew neheq in. Ango bi riyeke rastirîn li heqî û neheqiya wan bigerim, wan li hev bînim û bi rê bikim. Ev bersiva lêwik jî bi bavê wî rast û xweş tê. Zana dest bi pirsê xwe ya sêyemîn dike û dibê:

- Baş e, lê ku du merivên baqil werin, gilî û gazinên xwe bi te de bikin, tu ê bi çî awayî wan li hev bîm"?

Li ser vê pirsê bavê xwe, kurik serê xwe dixê ber xwe û hinekî dirame. Dûre bi pişirîn serê xwe radike û li bavê xwe dinêre. Bavê wî hêdî hêdî destê xwe li qevza şûr dişidîne, Ji zana wetrê lawik nikare bersiva pirsê sêyemîn bide, loma dipişire. Lawik jî dizane ku bavê wî hêrs bûye. Lê kurik her dipişire û bersiva pirsê sêyemîn jî weha dide:

- Bavo, ez ne bawer im ku gilî û gazinên du kesên baqil ji

163

hev hebin. Ku hebin jî, ew ê di navbera xwe de safî bikin. Ma çî pêwîst e ku werin ba min û te?

Zana li ser vê aqilmendiya kurê xwe bi qasekî dirame, dûre li xwe divarqile, bi pişirîn û kêfxweşî şûrê xwe dixê hundurê kalan.

164

FERZEND

Pîrejineke salmezin heye. Porê wê sipî mîna hirî ye. Piştî wê xûz, ruyê wê qermiçî ye, dest û ling lê dilerizin. Ku bi alîkariya gopal jî nebe, ew ê nikari be li ser lingên xwe bisekine.

Xwendin û nivisandina pîrejinê tune ye. Lê wê ev hemî salên xwe bi jiyaneke rengoreng buhurandiye, jiyaye û dîtiye. Ango wê porê xwe î weke hirî li ber tavê sipî ne kiriye. Erê, li gelek welatan ne geriyaye, pirtûk û pênuş bi destê wê ne bûye, lê paniyên wê yên qelişî jî dide xuyakirin ku di ser gelek deşt û newalan re gav kiriye, pêl ciyên şil û zuwa kiriye, û gelek tiştan ji jiyana xwe ya buhurî fêr bûye.

Di dawiya vê jiyana xwe de ji xwe re zarokê peyda dike û dixwaze li gor dilê xwe xwedî bike. Ji bo ku yekî zana û şariza ji vî ferzendê piçûk derxîne,

di piçûktiya wî de li ser disekine, tiştên herî piçûk jî pê dide zanîn ku heta kurik mezin dibe.

Ferzendê pîrejinê mezin dibe û anuha wek xortekî şepal û sermiyanekî malê, vatiniyek li ser milê wî ye. Herçiqas wek sermiyanekî malê xwediyê vatiniyekê be jî, forma hiş û aqilê

165

wî li ser formulên şîretên pîrejinê çêbûye. Ji piçûktî, heta roja îroyîn jî pîrejin li ser sekiniye û her jê re gotiye: «Kurê min, ferzendê min!.. ku tu li civatekê, li deverekê rûniştî, bila haya te ji te hebe. Hertim li gor xwe û giran bipeyive, xwe ji peyvên sivik, erzan û piçûk biparêze ... bila ciyê te bilind be,»

Ferzendê pîrejinê jî wusa dike. Di civatekê de dema ku mijarek tê peyivîn, ew jî ji wan girantir û mezintir dipeyive. Dema ku civatek li bin siya dar, an jî dêwarekî rûdine, kurê pîrê jî derdikeve ser dîwêr, an jî bi darekê ve hildikişe jor û ji wir beşdarî galegalên civatê dibe. Çi mijara ku civat li ser dipeyive, kurê pîrî gotinên ji peyvên civatê mezintir û girantir dike.

Rojekê mezinê gund banî hemî mîrên gund dike ku li oda wî bicivin û bi hev re xwarinekê bixwin. Li ser vê yekê ferzendê pîrejinê radibe xwe tevdişidîne û ew jî berê xwe dide oda mezinê gund û diçe.

Wexta ku ferzendê pîrê xwe digêhîne mala mezinê gund û civata ku li bende xwarinê ne, li gor şîretên ku heta anuha girtine, çavê xwe li ciyekî bilind digêhîne. Dinêre ku ciyê herî bilind, mezinê xwediyê malê lê rûniştiye û li gor şîretên pîrejinê ciyekî bilind tune ku ew lê rûne. Lawik çav berdide caxên nivînan, pê ve hildikişe jor û li wir rûdine. Ev tevgera kurik bala tevayiyê civatê jî dikêşîne, lê ji bo xatirê naşîtiya wî kesek jê re tiştêkî nabêje û pê dilê wî naşikîne. Civat her dipeyive.

Ferzendê pîrê bi qasî bîstekî bêdeng dimîne. Lê piştî demekê ramana şîretên pîrejinê dikeve bîra wî. Xwe bi xwe biryara xwe dide ku li gor şîretan êdî dest pê bike. Bi rastî jî li gor gotinên pîrejinê, ji xwe re ciyekî bilind peyda kiriye. Tenê peyvên mezin û giran mane.

Çi malmezin û çî xizanên gund, dema dest bi peyivînê dikin, ji sedî nod û neh mijarên wan, li ser karûbarên wan e. Li buharek weke sala îsal, çêlî

heywan û zevîyan jî kirin, ne tiştêkî dûrî aqilan e. Loma ev civata jî anuha mijareke weha bi lêv dikin û dibêjin:

«Îsal çêre pir e, berx û golikên me ê têr bixwin, ji vê dest-
166

pêka buharê heta payîza paşîn jî pez û dewarê me ê bi şîr bi-mînin ... »

Ferzendê pîrê baş bala xwe dide ser ku mijar li ser pez û dewaran e. Loma ew jî dikeve ramanê û di xeyalên xwe de li heywanekî mezintirîn digere. Ji bo herkesî ne asan e ku bizani be ka li dinê mezintirîn heywan kîjan e, lê kurê pîrê şitirê dizane. Di nava şorgermiya civatê de, ew du sê caran jî vê peyva şitirê dibêje, lê zêde bala kesekî nakişîne. ReWş êdî wusa dibe ku serî gavê ew peyva yekî ji civatê dibire û dibêje:

Şitir.

Di çend carên pêşîn de, çend kes di bin çavan re lê dinêrin, dev û pozê xwe xwar dikin ku ew dev ji vê peyva xwe ya şitirê berde. U ne dev û pozên xwar û ne jî awur ên tûj peyva şitirê ji devê ferzendê pîrê dûr dixê. Piştî ku ew carek din jî vê gotina xwe dike, ji civata hêrsbûyî -rîsipiyek xwe nagirê, hustuyê xwe ber bi caxê nivînan dizivîrîne û dibê:

- Şitir çi ye, lawo ehmeq!? .. Ev çi peyvên tewş e, tu ji sibê de dila! ..

Ferzendê pîrê destê xwe ber bi rîsipî dirêj dike û bi dengêkî berztir dibê:

- Wîî ... mala te ne ava, apê hecî! Ma tu bîn nizanî bê şitir jî çi ye? Deve, deve ... ew heywanên ku hûn çêlî wan dikin, ji wan hemîyan jî mezintir û girantir e.

Kesên di civatê de bi niçeniç serê xwe dihejînin û di ber xwe de dikenin. U piştî demeke kurt dîsa dest bi mijara xwe ya pez û dewaran dikin. Ferzendê pîrê dinêre ku dîsa kes çêlî şitirê nake. Bi rewşek matmayî li ser caxê nivînan diqîre û dibê:

- De qeyê te tew heywanekî bi navê şitirê ne dîtiye, apê hecî. Ji hespekî jî berztir e. Barên çar keran jî dikare bikêşîne. Weke goştê berx û golikan, goştê şitirê jî tê xwarin ...

Ji civatê yek xwe nagirê, radibe ser xwe diçe wî ji ser çaxê nivînan dadixîne xwarê û ji hundur davêje der. Herweha beriya ku li mala mezinê gund xwarina civatê were ber, ferzendê pîrê berê xwe dide malê û vê çîroka xwe ji pîrejîne re kat dike.

167

Li ser vê yekê pîrejin li ber ferzendê xwe rûdine, ji nû ve wan şîretên xwe jê re bi lêv dike.

168

ÎMPERATORÊ xast

Merivên kwîr, ker û lal, an jî ji dereke xwe kêr, ji xwe di bûyîna xwe de xwediyê vê kêmasiya xwe ne. Yên ku piştî bûyîna xwe, di jiyane de trênek lê diqelibe an jî ji kerekê de dikeve û dereke xwe dişikîne, ji xwe ew êdî dibê xwediyê derd û kulan. Ji bilî van tiştên ku serê meriv dêşîne û ji meriv re dibine derd, carina meriv bi xwe jî dibine sedemên derdên xwe.

Ev merivê ku em ê çêlî wî bikin, xwediyê derdên ser derdan e. Derdê wî jî pirseke xilûxwar e. «Aya merivên bê derd hene?» Xwe bi xwe biryara xwe dide ku bizani be ka kesên bê derd hene an ne. Ji bo ku vê pirsê di serê xwe de zelal bike, radibe jiyane li xwe diherimîne, jin û mala xwe li cî dihêle û bi çolan dikeve, da ku bizani be ka merivên bê derd xwediyên çi jiyane ne.

Ji gundiyan dest pê dike. Merivên rênçber, pale û cotkar gazinên mezin dikin, derdên xizan û neçaran bêpîvan û gelek in, derdên keç û xortên dildar nayên kişandin, derdên kesên polîtîk pir û pir giran in, çareya derdên kal û pîrên li ber mirinê peyda nabe û hwd ...

169

Mêrik li gelek deveran digere, bi her babetên rengên civatê re dipeyive, guhdariya wan dike, lê hemî jî li gor xwe xwediyê derdekê ne. Mêrik gelekê dirame, xwe bi xwe diponije û di dawiya dawîn de birayara xwe dide û xwe bi xwe dibêje: «Yekê ku ji hêla zewac û jîyana xwe ve, ji hêla tirsax nexweşiya giyanê xwe ve derdê wî tune be, ew jî mezinê welêt e. Mezinê welêt jî împêrator e,»

Mêrik êdî vê kul û kovana dilê xwe, ne ji karger û karmendên bajarî û ne jî ji gundiyan reben û belengaz dipirse. Rasterast dide ser riya împêratorê welêt û diçe.

Piştî gelek şev û rojên dirêj, mêrik xwe digêhîne bajar û qesra împêrator. Li ber devê deriyê qesrê, daxwaza dîyîna împêrator ji balbasan dike û ji wan tika jî dike ku ew vê daxwaza wî bigêhînin împêrator.

Gelek nabuhure mêrik bi îcaze dikeve hundurê qesrê, li dorhêla xwe dinêre ku ji ber devê dêrî heta ber textê wî yê zêr û zîvîn, ji balbas, paşmêr, xulam û cariyên ku di fermana wî de ne, meriv xweliyê bavêje li erdê nakeve. Piştî ku mêrik daxwaza dilê xwe bi awakî dizî ji împerator re vedike, împerator banî du berdevkên xwe dike û bi wan dide zanîn ku ew mêrik di hundurê qesrê de bigerînin.

Mêrik bi berdevkan re di hundurê qesrê de digere. Li jor, li jêr, li hawirdora xwe, bi kurtî li kîjan hêla xwe dinêre û çî tiştê ku di jiyane de ji bo merivekî bibe daxwaz, heye. Nanpêjên ku bikari bin ji her quncikên dinê xwarinên xweş çêkin, balbasên ku bikari bin bi destê xwe î çepê heft kesên nola wî bidin ser hev, ji çavkilên erebên Misirî hetanî çavdûçikên Çînî, ji bejnekinên latînî hetanî porzer û devlikenên Îslandî ... ji her babetî cariyên wî hene. Qesra wî, rasterast ji bihuşta rastkîno perçeyek e.

Mêrik heft roj û heft şevan di nava qesrê de digere. Serê wî bal zelal dibe ku li dinê kesên ji derdan dût jî hene. Dûre împerator banî mêrik dike û li oda xwe, li kêleka xwe dide rû-nişkandin, Ji bilî wan herduyan kesek li odê tune. Piştî împerator sozek mêrê berê ji mêrik distîne ku ew ê ji tu kesekî re nebêje, çavên xwe ji mêrik re dişkîne û mîna ku bibêje, baş

170

bala xwe bide ser. Di vê navberê de, jinikek dikeve hundur, derbasî hêleke din dibe û di paş perdê de xwe dixemilîne. Jinik ewqas xweşik, ewqas lihevhatî ye ku devê mêrik li ber ji hev dibe û bê hemd dilopên avê bi devê wî dikeve. Dûre merivekî navsere dikeve hundur, bi piyê jinika xweşik digirê û dikevin odeyeke din. Mêrik ji xweşikiya jinikê hîna wusa devjihev û mitûmat e. Împerator hêdîka destê xwe dide ser milê mêrik û dibê:

- Baş guhdarî bike, ez ê anuha ji te re çîroka jiyana xwe kat bikim: Min zewaca xwe bi dilê xwe kir. Jina min gelek û gelek xweşik bû ... û ji nuha jî bêtir. Ji xweşikbûna wê ez ditirsiyam û min xwî dikir. Min dil tune bû ku ji bilî min çavê mêrekî li wê bikeve. Wê bi xwe jî ji min hez dikir û em bi hev şa û dilxweş bûn. Dema ku em bi hev re zewucîn, me rabû li ser hev sond xwar û me bext da hev ku em ê li darê dinê di ser hev re nezewucin. Ew êdî ya min bû û ez jî yê wê bûm. Ku ji rojan rojeke Xwedê ez bimirama

an jî ew bimira, li gor bextê me, me ê zewac li xwe biherimanda û em ê nezewuciyana.

Herweha sal û meh li me buhurîn. Rojekê ez derketim derveyî welêt. Ji ber sedemên nepayî ez bi qasî çend mehan ji wexta xwe dereng ketim. Dema ku ez vegeyriyam malwelatê xwe, min nêhirî ku jina min li ser bextê xwe ye û xatûniya xwe didomîne. Vê tevgera wê baweriyeke xurt da min û ez gelek pê kêfxweş bûm ku xatûna min wek mêrekî berê li ser soz û bextê xwe ye.

Jiyan her berdewam bû, wext buhurî û xwe da ber rojekê.

Jina min ê biçûya mala bavê xwe. Min rabû ew bi rê kir û çû. Bi qasî çend mehan di pey çûyîna wê re, nûçeyeke bêxêr gihîşt destê min. «Jina min, xatûna berdilê min ... ji hespê de keti bû û miri bû.» Dema ku min ev nûçeya ha bihîst, bêhna min teng, dilê min xirab û serê min tevlihev bû. Min nizanî bû ku ez ê çi bikim.

Mehek, dudu, sisê ... herweha salek di ser vê rewşa min de buhurî. Şêwirmendên min xwe havêtin bextê min, pêşniyarên zewacê dane ber min ... lê çi kirin ne kirin, min xwe li zewacek ser xatûna xwe re xwedî dernexist. Şevê nîvê şevan xew li min

171

diherimî, ewkê min serî hildida, şeytan dikete binçengê min û digot, bizewuce. Lê min dîsa ling dida ber xwe û xwe bi xwe digot: Na! Herweha ne şêwirmend û gelê min, ne jî şeytanê şevên bêdeng û ewkê min soza bextê min bi min dan xwarin.

Ku tu rastiyê bibêjî, min gelek dixwest ku ez bizewucim.

Lê sonda me, heta mirinê bû. Di ser mirina wê re gelek wext buhurî. Min êdî mirina wê û kula dilê xwe ji bîra kiri bû. Lê ez hîn jî li ser sonda xwe bûm.

Di xweşikbûna wê de gelek keç û jin hebûn û ji bo min keti bûn dorê. Ez bi xwe jî ketim rewşeke pir xirab. Pirî caran min dil hebû ku ez bi cariyên xwe ve li ba bikevim. Lê dema ez li navûdengê xwe difikirîm, tirsarîswabûnê li min radibû. Wê çaxê jî min xwe diguvişand û diguvişand. Lê min nêhirî ku bi vî awayî nabe. Di dawiya dawîn de be jî, ez ê sonda xwe bidime ber ligan û bêbextiyê li xatûna xwe ya rihmetî bikim. Min rabû

bi awakî dizî du darik peyda kirin, şevê min batûyên xwe dan nav wan herdu daran û bi êşek giran min bada û bada ... hetanî ku min xwe ji mêraniyê de xist û min destê xwe ji vê pirsê zewacê şûst.

Min xatûna xwe, êşa xwe, soxê xwe û bi kurtî ji bilî navû-dengê xwe min her tiştên xwe ji bîra kiri bû. Lê piştî demeke dirêj, nûçeyek gêhîşt destê min û ev nûçeya ji bo min bû nûçeyek reş. Lewra xatûna min hîna sax bû. Ji hespê de keti bû, lê ne miri bû. Bêyî ku zêde li ser bifikirim, min rabû ferman da balbasên xwe û min bi wan da zanîn ku ew merivên nûçeya mirina jina min hanî bûn, werin dardekirin. Heta roja îroyîn, ji bilî min û jina min kesek pê nizane ku ew meriv ji bo çî hatin dardekirin.

Ez çî serê te bêşînim. Tew pêwîst nake ku ez wan galegalên di navbera xwe û jina xwe de ji te re kat bikim. Li gor bext û biryara di navbera min û jina min de, diviya bû em hustuxarê sonda xwe bibûyana. Ji xwe ez êdî mecbûrî vê yekê bûm. Lê jina min, mixabin wê wusa ne kir ... Piştî demeke kurt jina min serî hilda û got:

«- Ez vî tiştî napejirînim! Divê ez mêr bikim! Ez nikarim bê mêr bisekinim, jiyaneke bêreng bibuhurînim! Min mêr

172

divê!.. Ev tişteki ehmeqane ye!..»

Di ser min de giriya, kuriya, naliya ... Min xwe havê bextê

wê ne bû, min xwe havête dest û lingên wê ez li ber geriyam

lê ne bû. Min ev jî da xartirê jinbûyîna wê min ev yeka jî da

xatirê parsûyek xwar û rûreşiyê de û bavan ... Ez ê wekî din çî bikim! Ji bo ku kesek bi birîna me jî nizani be, min rabû jê re got:

«- Baş e. Tu çavên xwe lê bigerîne, te kîjan xortî bivê, ez ê banî bikim, mara we bi destê xwe bibirim û di qesrê de bi hev şa bin. Lê bila xelk wusa bizani be ku xort destirmanekî oda me ya raketinê ye,»

Û me rabû wusa jî kir. Ew jinika ku bi qasekî berê hat û xwe di paş perdê de xemiland, jina min bû. Ew xortê ku dûre hat û bi piyê wê girt jî... ez bibêjim mêrê wê bû, tu bibêje yarê wê ... »

Wusa xuyaye, hetanî ku împerator çîroka xwe diqedîne jî, di hundurê xwe de şer dike. Di hevoka dawîn de xwezî di ber de dimîne û hinekî jî bi tinaz vedigere ser mêrik û dibê:

- Belê ezbenîl A ev çend salên min in ku ez vê kul û kovana xwe, di quncikekî dilê xwe de dinixumînim.

Piştî ku çend dilop hêsir ji çavên împerator dirijin xwarê, mêrik bi îcaze ji kêleka wî radibe û dîsa bi destûr ji qesrê derdikeve.

173

û

DOSTOYEVSKÎ MERIVÊN REBEN

ROMAN

derdikeve

1. P. ÇÊXOV MİRINA KARMEND

kurteçîrok

1. S PÛŞKÎN KEÇA KAPÎTAN

roman

derketine

Adres:

Weşanên Welat

elo KFH, Box: 40 88 14104 Huddinge I Sweden

Ev pirtûka ku di destê we de ye, ji çel û du kurteçîrokên gelêrî pêk hatiye.

Ev kurteçîrokên weha, bê cî û bê sedem nayên gotin. Di civatekê de, di navbera du kesan de dema ku peyv tê ser peyvê, an jî peyv li peyvê disekine, ev kurteçîrokên ha wê çaxê wek argument têne gotin. Bi katkirina van kurteçîrokan, çîrokbêj dixwaze rastiya gotinên xwe bi cî bike û pê peyva xwe rast derxîne. Tişteki herî balkêş jî ev e ku dema xwediyê çîrokê nikare gotinên xwe bi awakî zanetir û nimûnên berçavtir bide famkirin, «Yek hebû,» dibêje û dest bi katkirinê dike.

Ku meriv bi xwe li dora xwe nezivire, ol weke royeke sexte li dora meriv dizivire.

**

AX DAYÊ

Wesanên Mehmed Nas

Sêrta Azad

AX DAYÊ

MEHMED NAS

Naverok

-1Pêsgotin

-2J BO BÎRANÎNA XWEZA

-3DVÊ EZ HERM

-4AX DAYÊ!

-5L TE GERYAM

-6ÊDÎ EZ DÇM B XATRÊ WE

-7XEWNEK L BEHRA SPÎ

-8KEÇKA TAVSORKÊ

-9EVÎNA VEQETÎ

-11OXRBE YÛSV

-12BAJARÊ MRÎ

-13PÇEKÎ DN EVÎN

-14L BEHRA SPÎ PELÊN BOHTAN

-15ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -1-

-16ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -2-

-17ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -3-

-18ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -4-

-19ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -5-

-20ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -6-

-21ÇÎROKÊN BAJARÊ XEMGÎN -7-

Pêsgotin

ÇÎROKÊN HESTÊN XEMGÎN

Lokman Polat

Karwanê edebiyata kurdî bi cosî dimeşe, qelebalix dibe, pêşve diçe. ji

Amedê,

Mêrdînê, Hekariyê, Bedlîsê, Berfiratê, Serhedê û herêma Bohtan
edebiyatvanên kurd karwanê
edebiyata kurdî dewlemend dikin. Niha jî ji herêma Bohtan, ji bajarê
Sêrtê nivîskarekî ciwan
tevî karwanê edebiyata kurdî bû.

Rojnamevan, nivîskar Mehmed Nas bi berhema xwe ya yekem a edebî,
kurdî cihê xwe di nav
karwanê edebiyata kurdî de girt. Digel ku ev berhema wî ya yekem e jî,
wî bi vê berhema xwe
daye nîsandan ku ew di kar û xebata afirandina berhemên edebî de bi ser
ketiye.

Ez gelek keyfxwesim ku nivîskarekî kurd ê ciwan bi berhemeke edebî li
pirtûkxana
kurdî pirtûkeke din zêde kir. Û ez dilsadim ku wekî xwendevanê yekem ê
vê berhemê, min
pirtûkê beriya çapê xwend û di derbarê pirtûkê de vê nivîsê nivîsî.

Ez di vê kurtenivîsê de nikarim yekoyek behsa naveroka hemû
kurteçîrokan bikim.

Lê, bi tevahî ez dikarim vê bibêjim; naveroka hemû kurteçîrokan balkês
in, zimanê nivîskar jî
bas e û pak e. Mehmed Nas bi kurdîyekî zelal û hêsan nivîsiye ku
xwendevan ji xwendina
pirtûkê aciz nabin, zehmetî naksînin.

Nivîskarê rojnamevan Mehmed Nas bi vegotîneke edebî kurteçîrokên
xwe nivîsiye.

Wî bi metodeke nû û teknîkeke ku ji nivîsîna kurteçîrokên klasîk cuda ye
bi kar anîye. Yê ku

zanîna wan tenê di derheqê kurteçîrokên klasîk de hebe û haya wan ji çîrokên modern û postmodern tunebe, dê bibêje qey ev kurteçîrok nîn in.

Di kurteçîrokên Mehmed Nas de derd, kul û xemên rojane û êsa civakî hene. Dema mirov çîrokan dixwîne -bi taybetî jî çîrokên bajarê Xemgîn- dilê mirov digizgize, mirov xemgîn dibe, derûniya mirov serûbin dibe. Mirov ji pênuşa nivîskar rewsa zilamê ku 15 salan li hepisê razaye û pasî derketiye, lê tu karekî nedîtiye ku bixebite û lewre jî ew nikare pariyek nan ji bo malbata xwe bîne dixwîne, dilê mirov bi hal û rewsa wî disewite. Zilamê bênav (ku gelek kesên weha ku di rewsa wî de ne, hene û bi min nivîskar bas kiriye ku navekî lê nekiriye. Lewra ev çîroka vî zilamê bênav ku li hepisê razaye, ne tenê çîroka wî ye, ev çîroka bi sedan kesên wekî wî ye jî) ji ber rewsa kambax neçar dimîne û biryara xwe dide ku bajarê xwe terk bike û biçe ciheke dûr. Bi rewsa wî û bi sedan yên wekî wî wijdana mirov zîz dibe, dilê mirov dipirite. Derd, kul, ês û îroniyên civakî rengê ku bi dramên civakî hatiye nexsandin, naveroka pirtûkê xemilandiye.

Nivîskar Mehmed Nas di nav civakê de her roj bûye şahidê xem û êsên kesan, wî bi çavên serê xwe gelek bûyeran dîtiye û mijarên berhema xwe ji ber rewsa civakî afirandiye.

Wî bi sêweyeke hunerî û zimanekî edebî dîmeneke ji rewsa gelê kurd û belgenomeyeke ji tevkûjiya Mesîhîyên Keldanî rave kiriye. Helbet nivîskar netenê ês û xemgîniyê, herweha xwesî û evînê jî nivîsiye. Sahneya ereq vexwarina di nav rezê ber dêrê, gelek xwesa min çû. (Ez hêvîdarim ku dê roj bê, ez û nivîskar jî bi hev re biçin nav rezên wir û li wir vexwin, bi hev re sohbet bikin.) Nivîskarê ciwan Mehmed Nas di qalkirina evîna Rojhat û Hîvdayê de ferîbendên evînê radixe ber çavên mirov. Xewn û xeyalên her însanî cuda ne. Hinek xewn û xeyal pîroz in û mirov bê wan nikare bijî. Evîn jî weha ye. Evîn wisa hêzeke bi qûdret e ku tu hêz pê nikare. Evîn reng dide jîyana mirov û mirovên evîndar ji bo evîna xwe ji hertistî re amade ne. Di jîyanê de yên ku herî pir ês dîksînin evîndar in. Xewn û xeyalên edebiyatvanan bêpayan in. Karê herkesî nîn e ku di nav tavsorkê de keçeka spehî bibîne û rindî û bedewiya wê taswîr bike. Ji bo ku nivîskar Mehmed Nas bi edebiyatê re hesir û nesir e û ew afirînkerekî edebî ye, ew di nav tavsorkê de keçeka delal dibîne û bedewiya wê bi hunerekî edebî ji xwendevanan re rave dike. Di kurteçîrokên pirtûka Mehmed Nas de tisteke nûjen (ku mirov dikare bibêje ev di

edebiyata kurdî de jî nûjeniyeye) ev e ku; di çîrokan de mijar hene lê navê
leheng û fîguran
tune. (di hinekan de leheng jî tunin.) Çîrok bi sêweya vegotinê ne û ji bo
ku leheng û fîgur
nediyarin, tunin, dîyalog jî tunin. Yê gotûbêj -anku nivîskar- behsa her tistî
dike û qalkirina
bûyeran û taswîra tistan ew bi xwe dike û ew leheng û fîguran dide nasîn.
(Di qalkirina 7
çîrokên bajarê Xemgîn de çend gotûbêjên ji gel hene û ew regekî gelêrî
didin çîrokan. Mirov
ji bo van çîrokan dikare bibêje ew çîrokên gelêrî yên ku ji ber
serpêhatiyên rasteqîn hatine
afirandin in. Helbet kurteçîrokên wî yên din jî ji ber rastîya jîyanê hatine
hunandin(.
Heft çîrokên dawîn yên bi sernavên “Çîrokên bajarê Xemgîn” regekî din
daye
pirtûkê. Di van 7 çîrokan de qetlîama eqaliyeta olî -Mesîhiyên Keldanî- tê
qalkirin. Nivîskar ji
devê çend pîrejin û pîremêran çîrokan pêskêse xwendevanan kiriye.
Nivîskar ji devê kalepîran
û bi taybetî jî bi devê zilamekî kalepîr ê Keldanî ku navê wî Ammo Caro
ye û bûye sahidê
qetlîama Keldaniyan, komkûjiya wê demê nivîsiye.
Wek tê zanîn, dewleta dagirker a Osmaniyan di sala 1914-an de dest bi
qetlîama
Mesîhiyan kirin. Jön-türkên rêxistina "Îtîhad û Terakî" nîjadperest û
olperestên xedar bûn. Bi

fermana wan bi hezaran Mesîhî -Ermenî, Asûrî, Suryanî, Keldanî- hatin qetil kirin. Ammo
Caro yê fileh ew dem zarok bûye û ew bûye sahidê qetlîama Mesîhiyan.
Li gor ku ew behs
dike, di gel kustina keç, jin, mêr, kalepîr û zarokan, leskerên Osmaniyan
30 hezar pirtûkên
dêra Keldaniyan jî sewitandine. Ew pirtûk ji bo mirovahiyê xezîneyeke
giranbiha bûn. Pirtûk
bi tîpên Suryanî, lê bi zimanê kurdî hatine nivîsîn. Ev xezîneya giranbiha,
çi heyfe ku bi destê
jön-turkên hov û barbar hatin sewitandin.
Dema min 7 çîrokên bajarê Xemgîn xwend, dilê min êsiya, hestên min
xemgîn bû.
Min ê ku dema nivîseke bixwendana ewqas cixare nedixsand, di dema
xwendina van 7
çîrokên bajarê Xemgîn de min nêrî ku min cixare li ser cixarê pêxistiye û
kisandiye. Ji ber
wehseta ku leskerên dewleta dagirker li dijê Mesîhiyên Keldanî pêk
anîbûn, derûniya ruhê
min xirab bû. Min di can û ruhê xwe de êsa ku keç û jinên Keldanî
kisandine, zilma ku wan
dîtine, di can û ruhê xwe de hîs kir. Ji ber xwendina çîrokên komkûjiya
Sêrtê xewa min nehat,
ez li ser neheqiyên dîrokî ramiyam.
Pirtûka Mehmed Nas di vî warî de weke belgeyameyê dîrokî ye û
nivîskar bi devê
Ammo Caro û kalepîrên din rastiyeke dîrokî derxistiye ronahiyê. Lewre jî,
çîrokên Mehmed

Nas çîrokên hestên xemgîniyê ne û divê xwendevanên kurd van çîrokan bixwînin.

Ez nivîskarê pirtûkê Mehmed Nas pîroz dikim ku wî berhemeke edebî, gelêrî û bi reng dîrokî

afirandiye û pêskêse xwendevanên kurd kiriye. Wî bi vê berhema xwe çand, edebiyat û

zimanê kurdî pêsve xistiye, pirtûkxana kurdî dewlemend kiriye.

J BO BÎRANÎNA XWEZA

Xweza!

Ma heft meh têra te fikir? Ji bo vê dinya qehpe û derewîn. Te xwe amadeya vê jiyana

kambax û teres fikir. Baweriya te pê hat, lê tu nîvrê hatiyî histin. Tu hatiyî xapandin, pê

baweriyên te leyistin. Ez dizanim pêluxên agir berdan nav dilê te. Ez dizanim birîna

baweriyên sikestî, çiqas dijware! Wê sevê tû bûyî mîhvanê dayik û bavê xwe. Mîhvanekî

bêdeng, bi vê bêdengiya xwe, te dil li me sewitand. Lê jana vê jiyane te hilnegirt û dîsa

vegeriyayî bihûstê.

Erê Xweza hê tû di zikê dayika xwe de bûyî, Bijîsk û tabîban fermana te nivîsandibun, li ser pelên qirêj û gemar. Ji wê fermanê pênuş giryabûn, pirtûk ji bo te

peyvîbûn. Baweriyame li wê fermana gemar nehat, me nedixwest em bawer bikin. Tirsê ne

tenê dilê me hemû lasê me girt. Hêvî dîsa hebû kurê bavê xwe. Em çawa bikin ew û biryara

wan bi serket. Lê tu dijî fermanê hatî û te raperînê kir, te li berxwe da.
Heya seetek
berxwedana te dom kir. Ez hatim alîkariya te, te birîndar kiribûn, piyên te
sikandibûn tû
nedikariyayî bimesî. Wekî hevsalên xwe tû negiriyayî. Erê Xweza ez û
hevalên xwe em hatin
alîkariya te, lê me jî nekarî em vê fermanê têk bibin. Tîr ji kevan hatibu
berdan me nekarî em
li ber bisekinin. Rondik bû perde li ber çavên me. Gelo tû ji me xeyidîbû
qey? Te ne dayika
xwe dît, ne jî bavê xwe himbêz kir. Em ji hesreta germahî û bîhna te
kizirîn. Te me ji wê tama
xwes û cuda hist û tû çûyî, bi tenê qasekî hindik min jiyana te dît. Bi dîtina
qasekî hindik
destûr hatibû sitandin. Hemû hêviyên min sikestîbûn, min ronahiyê
digeriya, li nav taristana
gemar de. Hêdî ji tariyê neditirsiyam. Hê ez li nav vê hêlekana jiyane xilas
nebûyîm, hê
birînên dilêmin hisk ne bûyîn, birînên kûrtir li min peyda bûn. Te digot
qey ez bûme behra jan
û keseran. Ez li nav van janan de digevizîm. Digotin “Jan mirovan
dikemilîne” ecep wisa ye?
Min dixwest jê bifilitim û xilas bibim. Lê ez hatibûm girêdan, Bi qeyd û
zincîran. Bi wê qasê
dîtina te besê min bû. Dilêmin hat ferikandin, bîhna min vebû. Ez hêdî
bûbûm bav, bavekî dil
sitûxwar û bêçar. Tû hêdî nayî jibîrkin, wekî her sê birayên xwe. We
paytexta dilê min de

hêlîna xwe çêkiriye Xweza, heta dawiyê hêlînekî germ, hêlînekî têr aram
û azad de hûnê her û
her bijîn...
Xweza ya min!
Ez di nav wê gengesî û soka balkêş de diçûm û dihatim. Bapîrê te çû gazî
Mela Qedrî
kir, ji bo sûtina te. Nîvê sevê me birînên te paqij dikir, lê birîn kûr bû. Ji
wê kûrahiyê, wekî
lehî xwîna te ya sêrîn diherikî. Me te disûst, Xwudê jî dilê te paqij bike.
Mela jî ji berxwedana
te ya jiyane sas ma. Pêşî bawer nekir ku tû jiyayî û te li ber xwe daye.
Sûtina te ve diayên
qedîm dihatin xwendin. Me te bi merasîma diayên pîroz bi rêdikir. Xweza
tistekî bala min
kisand, me te disûst, lê te qet çavên xwe venedikir. Min çavên te nedîtin,
gelo çavên te
çawabûn? Me avê li te dikir, te devê xwe vedikir. Me te paqij dikir, tû ges
dibûyayî. Piyên te
yên sikestî te pir êsandibûn Xweza. Dest û piyên te yên biçûk çiqas sêrîn
bûn Xweza. Min
destê xwe da te, hê jî piçek germahî bi te ve mabû. Ji cihê derziyê xwîn
diherikî, me wî jî
paqij kir. Kefenên spî me amadekir ji bo te. Hinek jî axa xîç, bi toza axê
bedena te ya biçûk
hat ferikandin, xwesê te diçû. Tû ji axê hatibû lê, te hêja bêhna axê tam
dikir. Dîsa li nav
kefenên spî tû hatî pêçandin û li sanesîna malê tû hatî raxistin heya
berbangê. cihê te hênik bû

Xweza. ax Xweza ax! Te rondikên çavên min zûwa kir. Ez nizanim bi vê kefena biçûk wê çawa te bêxin nava gorê? Çawa axa sar berdî ser bedena te? Xweza tû melayikek biçûk, pariyeq can û kezeba bavê xweyî...

DVÊ EZ HERM

Jiyana min li vî bajarî dawî bû. Êdî divê ez herim; cihên dûr, welatên biyanîyê, warên xerîb û xûrbetê û bibim penaberek li ser rûyê erdê. Evînamîn! êdî ez nikarim wekî te dergehên vî bajarî vekim, kolan û kûçeyan de bigirim, silav bikim, hembêz bikim û lê xwedî derkevim. Êdî ezê nikaribim wekî te li Girê Keçikan, êvaran bi vexwarina çayê re, temaseya daketina rojê û tîrêjên wê yên bi nalîn bikim. Ezê nikaribim destê te bigirim, germahiya te êdî dilêmin wê neferkîne û mist nede. Ronahî û birûskên çavên te êdî dilê minê tarî ronî nake. Peyvên te birînên rûhê min derman nake. Ji xwe te gotibû “Li vî bajarî evîn qedexeye!” û vî bajarî tû car dawî li evînên xwe ne aniye, her tim jiyana li vî bajarî nîvrê histine û jiyana evîna me jî wê nîvrê bimîne. Lê em bûn dîlê dilê xwe. Tistek ji destê me nedihat. Bi tenê biryaran me di anî cîh. Dîsa biryar hatiye sitandin û divê ez herim, erê ji hev veqetîne re hindik ma. Ewr li ser dilême wê bigere û birûsk wê dakevin li nîvê kezebê dû sê dilop hêstir wê ji çavên me werin

xwar. Ezê bixwazim te himbêz bikim û bigirîm, lê ji sînorê kevnesopiya ezê nikaribim derbas bibim. Bi tenê dilê xwe de ezê bêjim bi xatirê te û tê bi çavên xwe, ji min re bêjî oxirbe û dilêxwe da tê bêjî evîna min, yara min neçe neçe neçe... Evînamin; “Qey her kes kerr bûye ku kes qîrîna vî bajarî nabihîse! Qey her kes kor bûye ku hêstirên vî bajarî nabînin! Qey her kes bê dil maye ku kes jana vî bajarî hîs nake! Gelo kîjan welat ji kerba mirovên xwe dîn û har bûye. Kîjan welatî serpêhatî û çîrokên xwe ew qas bi ser hevdu re tîr kirine. Kîjan welat li zimanê xwe geriyaye...” ev bajarê xwedî sê erd, sê çem û sê ziman. Ev bajarê kevnare û qedîm. Bi dewlemendiya xwe ve reng daye saristaniyên Mezrabohta. Ê pêsî ne ezim ku terka vî bajarî dikim û ne jî yê dawî. Ev bûn çend sirgûn ku vî bajarî di dilê xwe yê tijî de jiya! Ev bûn çend sirgûn ku xwîna vî bajarî mêt! Ew sirgûnên berî noht salan, Ew sirgûnên gelan, gelên Ermenî, Asûrî, Kildanî û Sûryaniyan. Ew sirgûnên ku li dewsa sahî û hembêzkerinê; girî, veqetandin û mirin histibûn li pey xwe... êdî li vî bajarî hemû kes li hêviya sirgûn kirina xwe ye. Bajar birêkirina zarokên xwe westiya! Çemê Bohtan bi xûm xûma xwe raperînê dike, Tehta Mendik qelisî, germava Bilorîs sar bû.

Seyrangeha Serê Zînî sewitî, Qesrên cas hildiwesin, Kolanên bajar diqîrîn,
Kûçe dinalin bi
qîrîn û hawar...! Hey hawar hawaaar ev bajar, bajarê miriyane! Bajarê
miriyane! Ma tû
nabihîsî evînamin deng nayê te?
Îro jî ev bajar zarokên xwe bi rêdike, alî tarîtiya mirinê û tûnebûnê ve
disîne. Li kolan
û kûçeyan de zarokên tînêrkês ji serma xwe li hev dipêçin, germahiya
hevaltiyê digerin,
selpakfirosên bê hêvî, li benda debara xwe ne. Ji rûyê boyaxkarên
pêlavan evîn dirije. Li
nexwesxanan de melayikên biçûk dimirin... ma tû nabînî? erê evînamin
divê ez herim
bajarekî, kanî digotin “jan mirovan dikemilîne” lê ezê janên xwe bavêjim.
Ji bîr bikim hemû
keseran. Tirs dibe sî dikeve pey min, keser dibe birîn, dikeve canê min,
hesret ji xwe bûye
Pêlûxeke agir û ketiye dilêmin. Bêje evînamin ez neçim, ezê çi bikim?...
AX DAYÊ!
Ma çi ferq heye di nava Stenbol û xerîbîstanê da? Bajarê veqetina dayik
û bavan, jin û
mêran, bira û xwahirziyan û bajarê veqetina evîndaran. Ha Stenbol û ha
çûna bê hatin, ma tu
ferq heye? Kî çûbe vî bajarî, jan û hesret ji xwe re kiriye sî û heta terk
kirina vî bajarî daye
pê xwe. Stenbol, bajarê di nava behra hêstirên çavên veqetiyên de mayî,
bajarê hêviya

bêhêviyan û Bajarê hêvîxwar. Erê dayê dema ba û bahozên xerîbiyê bi ser
welatê min de hat,
dîsa welatê me zarokên xwe ber bi vê xerîbîstanê ve bi rêdikir. Ez jî bi xwe
re birim, bi dileke
sikestî û ser nizim.
Ez dizanim di êvarên hênîk de, tû li benda min dimînî, xwarinên herî xwes
ji bo min
dipêjî. Bi sevan dîsa lihêf û doseka min li serê ban radixî. Lê dayê tu jî
dizanî êdî ez nikarim
werim. Ez bûme dîl û hêsîrê bahozên sar, ketime taya xerîbiyê û bûme
xerîbê welatan. Tu jî
dizanî êdî ez nikarim destê te jî ramûsim.
Ax dayê! ezê dîsa ji te tistekî bixwazim. Dizanim ez gelek tistan dixwazim
û gelek jî
bêarim. Lê ez gelek bi hêrsim û aciz bûme ji vî jiyana malxirab. Li ser
bedena min westahiya
bi hezar salan heye. Xewa min tê dayê, dixwazim bikevim li nav xew û
xewnên xwes. Ez
naxwazim zêdetir vê lîstoka jiyane bilîzim. Ez têk çûm û êdî ez ditirsim. Ev
ser û bûyerên di
herikandina jiyane de diqewimin, hêviyên min disikînin, xewên min
didizin bê wext û bi
xeman siyar dibim. Ez edî bi sevan, bi xemgînî û bi tirsê derbas dikim.
Bûyerên, radyoyê yên
li ser pêla kurt, buyêrên ku ez ji radyo Dengê Mezopotamyayê dibihîzim,
min gelek
ditirsînin. Êdî ez ji mirovan ditirsim dayê. Dengên komên mirovan, qêrîn
û hawara wan min

ker dikin. Ez dixwazim çav û guhên xwe bigirim dayê. Dixwazim nebînîm,
nebihîzim û
nefikirim. Lê ma ev jî çêdibe dayê? Lez û beza jiyanê, çûn û hatina
mirovan li kolanan de,
min jî dixwe nava vê helaketê. Çavê wan qerimîne û tev vala ne. Êdî çav jî
dikarin derewan
bikin. Ma tu vê jî dizanî dayê? Ez dîsa bi tena serê xwe mame, êdî
naxwazim di van kuçeyên
tarî û gewre de bimesim. Di kuçe û kolanên sar de, lez û bezên mirovan,
min dîn û har dike.
Ez ji leza wan aciz bûme, dixwazim demekê dirêj bisekinim. Ma ez
demjimêr an jî saeta di
milê xwe de biskînim, tê ji min bixeyidî dayê? Ez çî bikim êdî naxwazim
zêdetir li benda
hatina dem û dewranekê an jî li benda derbas kirina demeke bimînîm.
Êdî ez li bendamayînê
jî aciz bûm. "wext gelek zû diherike" dibêjin, lê ez bawer nakim, dixwazim
rojên xwe têr tijî
û bi heskirên xwe ra bijîm. Ma tu dikarî alîkariya min bikî dayê? Ma hewce
dike ku ez bêjim
"Min bêriya axa welat û min bêriya te kiriye". Êdî dixwazim ji Serê Zînê
temasa derketina
rojê, Mij û dûmana li serê çiyayên Bohtan, keskahiya li rez û bostanan û
heft girên ku li dora
bajarê min de ketiyên govendê bikim... Ax dayê! ez dizanim hêstirên
çavên te hesreta dîtina
mine, hema carekê bi dawî be jî, ez jî dixwazim dîsa te bibînîm...

Li vir hawar û qêrînên mirovan û rûtirsiya wan min ditirsîne dayê. Ma tu dikarî ji hovîtiya wan min biparêzî? Ez êdî xwe gelekî bê hêz dibînim û alîkariya te dixwazim dayê.

Dixwazim têkevim li nav xew û xewnên xwes. Tu dikarî li kêleka lihêfa min bimînî? Destê min bigrî û min bêxî xewê. Lê di xew de jî, min bi tenê nehêle dayê. Xwezî min careke din serê xwe dayna ser çoka te û heta rojeke nû, rojeke germ razam. Di tîrêjên wê roja nû de ji wê xewa sêrîn siyar bibim. Di asîmanek sîn û vekirî de dixwazim temaseya teyr û tilûran bikim.

Li ser girên bilind ên bajêr, dixwazim heta sev rûnim û çayê qaçax daqurtînim. Ez dixwazim dengê bajêr, ji Girê Keçikan bibihîzim. Bi sev jî ez dixwazim li wir bimînim. Li bin stêrkên çirusî dengê sevê guhdar bikim. An jî di rojek semiyê de li ber çemê Bohtan, di hênikahiyê de rûnim û dengê pêlên avê guhdar bikim. Ez dixwazim derketina heyveronê jî li vira bibînim. Dema heyveron, ji pista wan çiyayên bilind derkeve, ezê xwe bixim nava nepeniya wê û bi saetan li wira bimînim. Ezê di bin ronahiyê wê de, dilê xwe paqij bikim û ji nûve vejîm.

Ax dayê ma ezê dîsa bikaribim, bi te re li ser banê xusa xusa dengê pêlên sipîndaran

bibihîzim? An jî ezê dîsa bikaribim li ser axa xwe jiyaneke aram bijîm? Dayê
ma tû dikarî van
daxwaz û xwestekên min bînî cih?...Ax dayê vaye ez haleke wisa xerîb da
me. Ma gelo tû
çawayî basî dayê...?

L TE GERYAM

Çav diket li nav çavan, deng dernediket. Evîndar bi tenê pê çavên xwe û
dilê xwe
dipeyivîn, min jî dixwest bi tere bipeyivim çav bi çav û dil bi dil, lê tû
tûnebû.

Evîna te quncika di dilda dijiya, min destê xwe da jiyana dilê xwe û dengê
dilê xwe

gûhdarkir. Hatî xeyalên min û ketim payte li te geriyam, lê tû tûnebû, ne
li vir, ne li wir û ne

jî li tû deverên din. Tirsiyam ji tûne bûna te, lê hevî her û her dilêmin ê
stûxwar diferikand.

Li bajarê ku bîhna mozaîka gelan û çanda wan ya di talankirî difûra de
ketim pey te, li

kolanên bê mirov, kûçeyên bê zarok, xaniyên Ces ku hatibûn valakirin,
dîmenên mayîn bê

xwedî de û bajarê bê deng de li te geriyam. Li taxa kevnare û qedîm ya
Keldanan, ku niha

hatibû wêrankirin. Li nav xaniyên Ces û qesrên bi keviran hatibûn çêkirin
de min dengê te

dibihîst lê tû nedihatî xûyakirin. Kûçeyên teng û tarî de kesek tûnebû, lê
xeyala te ketibû

pêsiya min dimesiya. Min dixwest bigihîjim te û destê te bigrim lê li nav
taristanê de tû wenda

dibû, tû diçû kûçeyekî din. Li seranserê Ayn Salîbê (kahniya xaç),
pirtûkxaneyaya mezin ya
Katedralê de bi gavên hêdî hêdî dimesiyam, li ser masê vala pênuş ji
kerba bêdeng digiriya.
çav li ser kûlekên pirtûkan ket, pirtûk dipeyvîn, li ser dîroka qirêj û gemar,
roman û helbestên
nîvcomayî yên Sûryanan. peyvên te min dibihîst, lê dawî nedihat. Li nav
pirtûkên sedsalî û
pîroz, ku li serî bostek toz girtî de, rûpel bi rûpel li te geriyam, tû hatibû
nivîsandin lê min
nedizanî ez bixwînim û tama evînê û mirovatiyê jê bistînim. Min tû tam
nekir, min te ne dît û
tû ne li wir bû. Ji wir çûm Dêr Mar Yaqûb û ketim hûndir. Li nav Dêra
qedîm de min wêneyê
te li nav neqşên reng û rengên dîwarê de geriya, tû tûne bû. serpîskopos
Adday Sêr li Dêrê
ayînê fikir pê peyvên bihêz û xûrt de diqêriya, min peyva navê te ya
xwesik geriya, lê min
nebihîst. Min tû nedît û tû tunebû. Hatim ser kahniya Ayn Salîbê li nav
Sabata hênik de li
benda te mam, dilgerm bûm min xwêhda, min pirsî tû tûnebû. Ava zelal
ya ji birkê dihat, sor
bûbû min pirsî dîsa tu tûnebû. Ji qesra Ces pirsî tû ne li wir bû. Min ji sarab
çêkera pirsî tû
tûnebû, ji seraba sor pirsî te serxwes kiribû, lê tû nedihatî xûyakirin. Li
bajar de mesiyam gav
bi gav dilekî sikestî û stûxwar li erdê digeriyam. Li nav kolanên mezin û
hin kûçeyên ku

diketin ser kolanan dirêniya lê tû tûnebû. Daketim Girêkeçika li binê dara
Qizwanê rûnistim.

Ew jî bi tenê mabû wekî min, sax û pelên xwe wesandibûn hisk bûbû. Zor
û zehmetiyên

jiyanê re têk çûbû, demên berê dihatin bîra wî ew demên xwes... berê
bîhnekî xwes û cûda jê

difûriya, belê bîhna Ben ê. Li bin siha wî da çiqas mirov rûnistibûn,
ketibûn nav gotûbêjên

germ de, hinek li ser bajar dipeyvîn, li ser çand, hûner û hinek jî li ser
evînê dipeyvîn û

diketin xeyalên kûr û bêbinî. Çav diket nav çavan deng dervediket,
evîndar bi tenê pê çavên

xwe û dilê xwe dipeyvîn, min jî dixwest bi tere bipeyivim çav bi çav û dil
bi dil, lê tû tûnebû.

Çûm serê gira herî bilind li Serê Zînê bû êvar, roj hêdî hêdî diçû ava. Roj,
tîrêjên xwe yên bi

nalîn li ser bajar de berda, bedewiya xwe ya dawî kifs dikir û bi zeraqa
xwe ve daket heya

rojekî din.

Bû sev, êdî ez westiyam, seva tarî kirasê res li xwe kiribû, min nedizanî
îsev kî li ber

stêrka ye, min nedizanî heyv di çendê xwede ye? Seva tarî, çiqas diçû xwe
restir dikir. Min ji

sevê pirsî? Ma tenêtî para mine sevê?, ma kesek tûne dengê min bibihîse
sevê?, her kes xwedî

dost û yare, çima yara min nayê sevê? Ez li bajar geriyam, ma taxa min
kanî sevê?, Gazî

qûlingan bikin, bila yara min bînin, bibînim û himbêz bikim. Ma çî ji yara min hat sevê? Sevê
got; dawîya evîna te hat û derbas bû, dema te çû, ew roja bi nalîn daketî,
ew evîna te bû, tû
geriyayî lê te nedît lawo...
ÊDÎ EZ DÇM B XATRÊ WE
jiyan li ser min ve dimese, bi hemû giraniya xwe ve. hest, raman û kovan tije dibin di
dilêmin da. dixwazim birevim lê bêçare mame. Bi taybetî jî, mirov li ser min ve dimesin. Ew
kesên derewîn, xayîn û bêbav, dil bi kovan, kul û derdan dinale, di vî rews û jiyana bê bext de
difikirim... ji bo çî û kî ez dijîm? Derdor bi menfeet perestan dikele hinek mirov di rojekê de
rûyê xwe têxin deh siklan de.
Dîsa wekî her car ji xew radibûm, bi hêvî yên mezin min cil û bergên xwe li xwe
dikir. Di ketim nav kolanên bajêr gav bi gav dimesiyam. Bi hêviyên mezin min ji karxanan
pîrs dikir. Lê bê feyde dîsa kar tûne bû. Berîkên min vala li sûka bajar rûyekê nas digeriyam.
Rastî gelek heval û hogirên xwe dihatim mixabin min tû silavên germ û ji dil ji wan nedidît.
Ev ses mehê min bû ku ez ji girtîxanê derketibûm. Panzdeh salên min li girtîgehê derbas
bûbûn. Lê êdî min bêriya girtîgehê jî dikir. Li wir hevaltiya germ hebû, nanek dibû dû behr,

birînek, derdek, êsek dibû dû behr, sê behr, çar behr lê li vir bar hemû ser milên min bûn. Di civakê de tû qedr û siyanet ji bo min nemabû. Ji ber ku perê min, mal û milkên min tûnebûn. Hemû hevsalên min bûbûn xwedî mal û milk, lê ez hê di têrkirina zikê xwe û zarokên xwe de heyirî mabûm. Li nava bajar de êdî min nedixwest bigerim. Derdiketim diçûm li derveyî bajêr cihekî bilind û min temaseya bajêr fikir. Gelo ewqas xanî û avahî hebûn. Xwedêyo ma gelo tistekî li behra me jî nediket. Êdî min raperina jiyanê fikir. Ew panzdeh salên bihûrî, xwezî emrê min hemû bibûranda. Gelo ezê niha çawa herim mal bi kîjan çavî li xanima xwe û zarokên xwe binêrim. Ew bi hêviya nanekî germ, her roj min ji mal bi rêdikin, mixabin dîsa dimînin birçî û ez dest vala vedigerim. Xwedêyo..! Jiyanek wisa çiqas diware, bese ez êdî naxwazim bijîm. Rûyê min nemaye, dilê min heliya, kezeba min res bû. Hevalên min ên girtîgehê jî êdî cîhê xwe girtine lê min bi tû awayî nekarî li vê jiyanê de cihekî germ ji xwere ava bikim. Her û her li nav xemsariyê de diçim û tîm. Bi hezar, bi milyon cara ji xwe posmanim, tistek ecêb êdî ez ji mirov bûna xwe jî posman dibim. Xwezî ez kevirekî bûma, xwezî ez heywanekî, an jî darekî bûma, lê sed xwezî.

Car caran difikirim niha ez jî li vê dinê dijîm. wekî her kesî na, na, na, ez her roj dimirim her êvar, vegeramin a malê mirine, rûyê xanimê nêrînamin mirine, rûyê nêrîna zarokên min dîsa mirine. Ji xwe li mal tû tist ji devê min dernakeve, lal dibim, ker dibim, ez ne li mala xwe me wekî ku ez li nav xaniyekî cemed de bim wisa ez direcifim, dilerizim. Her hevokek axaftina xatûn ji bo min mirine. Berê de jî min xwest wekî ku ez her car, her roj bimirim, ezê ji rehê xwe xilas bibûma. Mixabin min nekarî, dîsa hêviyên bêbext û derewîn min xapandin, min nekarî ez xwe ji vê rewsê xilas bikim. Lê niha min cîhekî ji bo xwe peyda kiriye. Bi yek carî ez dikarim ji vê êsê xilas bibim. Vê berbangê min xatir ji xatûn xwestibû. Ev mehekî bû ku hê min xatûnê ra axivî. Ev peyv dilê minê birîndar ferikand. Heta hatina min a vêderê, ji çavên min girî kêm ne bû bûn. Rondikên çavên min zûwa bû bûn. Zarokên min bi sas û mat mayî li min nihêrî bûn, nedizanîn wê çî bibe. Paseroja wan çawaye û çî li benda wane... Jîna mirov û mirovaniyê bi xewn û xeyalan ve girêdayî bû. Eger ez heya niha dijiyam, ew bi xêra xewn û xeyalan bû. Min gotina xwe ya dawîn jî got xewn û xeyalên min êdî miçiqî bûn. Ez li benda mirinê bûm. Mirina sar û seqem ku wê min ji vê jiyana bê bext û derewîn

rizgar bikira.

Wext êdî hatiye, wexta mirina sar û seqem. Berî ku ez herim min malbatê jî dît, erê

min ji wan re got; çûyîn heye, hatin tûne, hatin heye, dîtin tûne. Êdî ez diçim, bi xatirê we!!!

XEWNEK L BEHRA SPÎ

Ez bi tenê xerîba xwûdê kû li welatê xwe yê çar perçe ji dûr ketî. Min nedizanî çima,

evî bayî bêhna mirinê bi xwere anîbû û li vir jî hatibû min êdî behr ji bo min bû bû jehr. Li

ber perava behra sipî, di xew de bi dengê behrê ji xewa nepenî siyar bû bûm...

Li wextekî min zilamek nas dikir. Navê wî Rojda bû, her dem rûpelek sipî û pênuşek

sor bi xwere digerland. Gelek caran demên xwe bi nivîsandinê derbas dikir. Esiqê keçikek bû

navê wê Hîvda bû. Keçik bajarekî kevin, ew bajarekî nû de dijiya. Ji xwe bi nameyên keçikê

re Rojda jî dest bi nivîsandinê kiribû. Gelek caran ji hev û dû re rûpelên tîr tijî, nameyên

evîne dinivîsandin. Temasa fîlm û gûhdarî stranên wekhev dikirin. Lê li bajarên cûda cûda

de...

Car caran Rojda nameyên ku dinivîsand bi min dida xwendin, lê tû carî nivîsên Rojda

min nedikarî heya dawiyê, ji serî heya binî rêz bi rêz bixwînim. Gava min dixwend, dilê

dibû behra xeman û tije kovan dibûn. Di nava nivîsê de hevokên wisa bikartanî ku min xwe nedigirt û nameyê dirêjî Rojda dikir. Bi tenê ew hevok, li ber dilê min hêja bû deh nameyên evînî. Dilê min tû carî xwe nedigirt ber dewama nivîsan dawî bînim. Wan evîna xwe bi nivîsandinê dijiyan. Kul û xemên xwe pê hibrê pê nûsê bikartanîn û awayekî hûnerî ser rûpelên sipî hemû hêrsên xwe dîresandin û nemir dikirin. Evîna wan di nameyan de li ser rûpelên sipî û paqij dijiya. Li nava wan rêzan de peyvên wisa bê hempa, aram û qedîm bikartanîn kû wisa evîna xwe jî dijiyan. Min peyv nedidît kû vî evînî bas bidim qiset kirin. Evîna wan wisa mezin bû kû her roj peyvên evînî ên nû diafirandin. Evîna ji nameyan derketî her roj mezintir dibû. Ez ji vê rewsa wan gelek ditirsiyam. Ew xewnekî de hatin ser dinê, di xewnekî de mezin bûn û di xewnekî de dijiyan. Ditirsiyam ku xewnekî de ji hev û dû veqetiyên, ji xwe nedizanîn her xewnek xemeke û mereqeke. Ez ditirsiyam ku birasti jî negîhin hevdû, hêviyên wan biskên û bimînin bê hêvî. Ji xwe bêhêvî mirov disand mirinê. Min bawer nedikir kû jiyana rastîn û jiyana nameyan li hev bikin û xwe bidomînin. Tistên kû dinivîsandin, ji xeyalan derdixistin û dijiyan. Çiqas ez ditirsiyam ku dû evîndarên xeyalperest,

di jiyana rastîn de têk biçin jî, lê disa jî wan baweriya min ji evînêre xûrttir kiribûn...

Rojda nepenî, aramî, bedewî û germahiya xwe ve wekî rojê bû. Gava bi hêrs dibû ew

germahî dibû dojah. Ji nêz ve mirov diheland, ji dûr ve mirov hemû bedewiya wê didît û wekî

xwedayekî jê hêvî dikir. Neyarê taristanê bû, her û her ronahiyê dixwest û belav dikir. Hîvda

jî wekî heyvê, li nav stêrkan de ya herî ronahî, bedew û xwesik bû. Bi kurtahî wekî heyvê sipî

û aram bû. Min her û daîm ji Rojda re digot, têkiliyên we de lanetiya navê we heye. Çawa kû

roj û heyv bi hev re bijîn û negihin hevûdû ez bawerim hûn jî tu carî nagihin hev. Lê Rojda vê

yekê qet nedipejirand. Wî çaxî min dû cixare pêdixist, yek ji bo wî û yek jî ji bo xwe. Lê her

dû cixaran jî min dikisand. Xemgînî diket nav civata me ya germ. Ewî jiyaneke ji Hîvda yê dûr

ketî qet qebul nedikir. Gava roj ji sevê derdiket, pêşî Hîvda dihat bîrawî, pasê wekî bahozekî

diket dil. Roj diçû ava her tist bi dawî dibû, lê ew bêdawiya Rojda bû. Carna bi hêrs dibû derî

vedikir, diçû û li nav taristanê de wenda dibû...

Ez dîsa bi tenê dimam û xwe bi xwere diaxivîm, diwestiyam û li ser evîna wan min jî

rûpelekî din dinivîsand. Gava min li ser rewsa wan bi rêz dikir, di destên min de kûlîlk

vedibûn evînê bi hemû nepeniya xwe ve bedena min dipêçand. Dilêmin dîn
û har fikir. Hêrsên
xwe min jî dinivîsand û nemir fikir ji bo paserojê û nîfsên nû. Evîn nedihat
zûkirinê, jê ra
sebir diviya mîna sebra çiyayên Bohtan kû li ber ba û bahozan xwe digirt
û herdem aram û
bêdeng bûn. Pistî kû min nivîsandinê dawî fikir, ji mal derdiketim û li nav
bajar de li kolanan
dimesiyam. Wekî hercar dîsa rastî Rojda dihatim. Ji bo evîndara xwe
serxwes bûbû û li nava
kolanan de stranên evînê digot. Min jî bi wî re dest bi vexwarinê fikir. Ewî
seraba sor
vedixwar min jî avcehê dadîqurtand. Avceha cemed hemû kovanan ve
diket nava lasê min.
Rojda li nava qedehê dirênt û ji min re esqa xwe qiset fikir. Gava bi hêrs
dibû digiriya, ez jî
bêdeng dimam û mijekî kûr heya kezebê min ji cixara xwe dikisand.
Nizanim çima lê hemû
serpêhatî û zaroktiya xwe ji min re qiset kiribû. Wêneyên Hîvda yê pêra
tûnebû, lê dîsa jî
çavên xwe digirt û hemû bedena wê wekî zindiyekî dîtibe xet bi xet qiset
fikir. Gava wî
Hîvda re dijiya bi hêrs dibû û direviya diçû seyrangeha Girêkeçikan. Xwe
li wir dirêj fikir û
guhdarî dengê axê fikir heya sevê. Bi sev jî li benda heyvê dima,
xwesikiya heyvê temase
fikir. Tariya sevê dibû mîna pora Hîvdayê û stêrk li pora wê re dialiqîn.
Nepeniya heyvê û

sevê dilê wî paqij dikir. Ewî digot, kesê kû bizanibe zimanê axê fêem bike,
ax gelek tistên
xwes, balkês, dem û dewrên bihûrî qiset dike...
Rojda hinek rojan gelek kêfxwes dihat li ba min, wî wextî min dizanî kû ji
Hîvdayê
jêra nameyekî hatiye. Gava diket hindirû derî digirt û rûpelê dixist destê
xwe. Bi dilgermî dest
bi xwendinê dikir. Pasê cixareyek zarokwarî dikisand û rûdinist li ber derî.
Min jî bi dilsewat
warî temasa wî dikir. Min rewsa wan qet bas nedidît hesret ne tistekî
hêsan bû. Belkî sing ber
û bedena wan ji hev dûr bû, lê dîsa jî dilêwan her û her bi hev re bû.
Nizanim çima lê hezkirin
ji bo wan pir hatibû dîtin. Wekî her car cihê xwe sekinî û di dest de cixare
bêdeng rawestî bû.
Her tist bi leza birûskê qewimî, Rojda nekarîbû barê derd, kerb û hesretê
hilgire. Min nezanî
çawa çêbû lê ew çûbû ser koça dawîn. Agir berda bedena min, nefesa
min çikiya, bi qasî
bîskekê dinya li ber çavê min res bû. Lê çi bû, çawan çêbû, ez nizanim.
Melkemot li xanî
geriyabû, mirin li odê bû. Rengê oda xwes raxistî guherîbû, mirin bi rengê
xwe yê sar û bîhna
xwe ya genî li hemû odê de bû. Cil û bergên me, dest, pî, mil, rû û hemû
lasê min, mehfûrên li
erdê raxistî, dîwarên odê yên sipî û her tist di nav reng û bîhna mirinê de
mabû. Ez bi seknekî

sebrê yê zana, kû ji çiyayên Bohtan hînê wê bûbûm, di cîhê xwe de wekî çiyayekî bi sebr sekinîbûm. Ez bi dûv demekî gelekî dirêj ji cîhê xwe bi hêdîka, kû hemû bedena min bi janeke bê payan ketî, rabûm li ser piyan. Min nezanî ez çî bikim, di nav tariyeke hibrî de bi tenê mabûm...

Ez bi tenê xerîbê xwûdê kû li welatê xwe yê çar perçe dûr ketî. Min nedizanî çima ev bayê kû bêhna mirinê bi xwere anîbû, li vir jî hatibû min, behr ji bo min bûbû jehr. Min nedizanî ev çîrok ji kû hatibû. Li ber behra sipî, di xewde bi dengê behrê ji xewa nepenî siyar kiribûm. Alîkî min xwîdan dayî, bi bayên germ ê çiyayên Bohtan, hêvî, xewn û xeyalên min.

Alîkî min bablîsoka behra sipî û bayê miriyan, a rast min te bi bîranî, û bi te siyar bûm. Nîvê sevê li ber behra sipî, di bîhnvedaneke havînê de, xewnên min hatibûn dizîn. Xew li min qedexe kiribûn, ez histi bûm bi tenê serê xwe û bi tevî sûretê te yê mîna heyveronê. Ta sibehan nedikariyam razê, lê dîsa jî ew xewna ku min dîtî de, ev gotina Rojda ji bo min dibû hêvî “tenê bûn tistekî kêrhatiye, hin caran li mirov tê” ez jî bêçare li welatê xerîbiyê, li ber behra sipî li wê tenêbûnê de li benda wê kêrhatinê mabûm...

KEÇKA TAVSORKÊ

Sevê dîsa kirasê xwe yî resê çem çem li xwe kiribû. Heyveron li asîman nedihat xuyakirin, lê stêrka me dîsa di cihê xwe de bû. Stêrkên mayîn li ser sevê mîna xaliçeyeke rengîn dihat xuyakirin. Êdî bajar jî westiya bû, ketibû xeweke nazenîn û ez li nav peyvên pirtûkan de diçûm û dihatim. Pênûs di destê min de bi xew ve çûbûm û ketibûm nav bîreke bêbinî û li nav deryaya xeyalan de wekî keştiyekî digeriyam. Roj dîsa wekî her car li ser coya xwe diherikî û ber bi qulibandinê ve diçû. Dîsa min temaseya daketina rojê dikir û difikirîm. Rengê tîrêjên rojê xwe bi ser bajar de berdabû. Hemû bedewiya xwe wekî diyariyekê berdabû ser dilê xwezayê. Min jî tama wê bedewiyê derdixist û dilê xwe bi vê aramiyê diferikand. Çavên min ketibûn li ser tavsorkê û kûr çûbûn. Ji niska ve tistek dihat xuyakirin. Di nav tavsorka gilover de siklekî ecêb dihat xuyakirin, çiqas diçû nêzîktir dibû. Çiqas nêzîk dibû, kûrtir dinihêrî. Pêsi mîna zarokekî hat xuyakirin û çiqas diçû nêzîktir û mezintir dibû. Ew siklê ecêb ji tavsorkê derket, lê siha wê li ser min ve dihat; bi matmayî min lê dinihêrî. Belê... ew keçikek bû; pora wê heta nav milê wê dirêj dikir. Dilê min germ dibû, dilerizîm. Bi sas û matmayî di cihê xwe de sekinîbûm. Bi tenê min nefes distand, dengê dil

dihat guhê min. Xwîna min dikelijiya, min nedizanî û tê dernedixist ka çi bi min hatiye. Belê ew tista bi nepenî keçikek bû. Keçikekê zirav û dirêj, mîna spîndarekî. Ruyê wê spî mîna ruyekî ji nav destan û efsaneyan de hatibû, mîna ruyekî peykereke antîk ku xwe li hember ba û bahozên wext û dewranan ragirtibe. Ruyekî sade, mîna ruyekî periyar henûn û delal. Lê tijî sir û sihêr, mîna berkanik û maskekê be. Dev û lêvên wê yên xwesik û li hevhatî. Xwedî nêrînên henûn, çavên res ên ronî, çavên kûr, çavên delal û gelekî sipehî. Ronahiya çavên wê tenik wekî tava heyvê. Ez nizanim çima, lê di hundirê min de tistekî mîna pêta çirûskekê pêdiket. Min dixwest tistekê ji vê rewsê derînim, lê bê çare dimam û min tistekî jê dernedixist. Min pir dixwest ku wê keçikê binasim, kûrahiya dil û ruhê wê binasim. Di bin wê berkanika xwesik, sade, paqij û saf de çi heye min dixwest bibînim. Hundirê min bi germahiya ronahiyeke tijî dibû, keleke germ ji dilê min radibû. Ez li nav dilgermî, heyecan, cos û pirsên di serê min de diçûm û dihatim, lê min nedizanî çi dibû. Ev keçika henûn kê ye? Ez li ku derê me? Ew ji kijan diyaran hat? Wê çi bibe? Min nedizanî van pirsan bi bersivînim. Di vê nepeniyê de diçûm û dihatim, min nedizanî çi dibe û wê çi bibe. Keçika delal qet nedipeyivî.

ez li cihê xwe sekinê, ew li dora min digeriya û destê xwe dirêjî min dikir,
dixwest ez pê re
herim cihekî. Qet nedipeyivî bi tenê bedena xwe ya xwesik dilerizanda û
li dora min diçû û
dihat. Ji niska ve dengê jê derket, ji wan dev û lêvên lihevhatî de ev gotin
herikîn; “Ma tu
dikaî ava Botan berjor biherikînî?, Kesê ku tehlukayan nede ber çavê
xwe, nagihêje cihê
xwe.” ev gotin ji devê wê derketin, gelo çî dixwest bide fêmkirin, min
nedizanî, min jê pirsî lê
ti bersiv neda. Keniya, daket nava tavsorkê û wendabû. Ê ez di nav pirs û
peyvên nepenî de
diçûm û dihatim. Min dixwest tistekî ji van peyvan derînim. Gelek fikirîm
lê min tu bersiv
nedidît. Keçika tavsorkê min di nav nepeniya xwe de histibû. Ketibûm nav
ramanên kûr û
bêbinî.
Ji niska ve bi dengê banga mêjê, ji xewa kûr siyarbûm. Erê di berbangê de
ji wê xewa
tijî nepenî û sihêr siyar dibûm. Bi tenê ew keçika tavsorkê a delal û bedew
dihat bîra min û ew
peyvên ku ji dev û lêvên xwesik herikiyîn man para min. Gelo dixwest çî
peyaman bide min
hêja jî ez difikirim, difikirim, difikirim.
EVÎNA VEQETÎ
Evîna me li Sêrtê sîn bu. Bajarê xwedî heft gir, sê erd, sê çem û sê ziman.
Ew bû

Girêkeçika, ez bum Serê Zînî. Ew bu Xerzan, ez bûm Bohtan. Ew bû çemê Basur ê aram, ez çemê Bohtan ê dîn û har...
Li nav heft giran de ya herî delal û bedew ew bû, Girêkeçikan. Hemû erdê wî sênahî bu. Her celeb dar li wir hebû, mina daristanekî biçuk. Hemu cureyên kulîlkan li wir peyda dibun, disibiya gulistanekî sîrîn. Hema bêje çukên hatiyê xuliqandin li wir bûn, li nav wê seyrangehê de wekî stranek bê hempa distriyan. Cihê mirovên bi rûmet û bi qîmet bû. Cihê mirovên zana, welatparêz û çandparêz bû. Sano, konser li wir dihatin amadekirin. Dengê sahiyê bajar fetih fikir. Ji xwe çanda bajarvaniyê jî ev bi xwe bû. Min te li Girêkeçikan dîtibû.
Li wê seyrangeha delal de, wekî gulekî nû biskivî, te hawîrdora xwe li nav bîhna xwes de histibû. Bîhna te ji wir difuriya. Gava çavêmin bi te ketin dem û dewran sekinîbûn. Min li rûyê te yê gilover û gewher, eniya te ya pak û sipî, bêvila te ya biçuk, lêvên te yê mezin, devê te yê hertim hinekî vekirî, çenga te ya hinekî guloverî nerm, stuyê te yê dirêj û li gerdena te ya gewher dinihêrî û ez difikirîm... Girika herî bilind li Serêzînî min dil fikir eniya te û çavên te yê res belek ramusa. Pora te ya resik mist da. Destê xwe bibira stuyê te, di pas re

stuyê heta pistê mist da. Germahiya te bibihîsa. Min bi nêrînekî zehf kûr,
bala xwe dida rû,
çav û devê te û dil dikir û dixwest. Ji kenê te yê sivik û sermoke, rûyê te
yê delal re helbestekî
bi afiranda. Helbestekî sedsala dawiyê...
Tu bûyî gula Girêkeçika, bîhna te li wir difuriya. Min te bîhn dikir. Min pir
dixwest,
destê xwe dirêjî te bikim. Lê ji sînorê kevnesopiya nediwêriyam derbas
bibim. Stuxwar û fedî
kirî, vedigeriyam cihê xwe. Jan hemû bedenê digirt dinaliyam, lê min
nedikarî ez bigirîm.
Min te hînî kisandina cixarê dikir û te min hînî êsê dikir. Min te hînî
vexwarina avcehê dikir,
te min hînî janê dikir. Min dixwest hêviyên min bibihîsî û evîna min re
bikenî. Em ji hev
hatibun durxistin. Berê min dan Serêzînî, li wir bi tenê ez hebûm. Erdekî
rût û tazî û ez. Min
distraya ewî guhdar dikir, ez diqîriyam ew dihat hawara min. Li wî cihê
bilind her der dihat
xuyakirin, hemû bajar li bin piya bû. Girêkeçikan, Bitimkê, Eynsalîb, Kahnî
Bireykê, Sêx
Tirkî, Sêx Tayyar, taxa Çaqmaqê, gundê Ciwanika hwd. Sêrîn dihatin
xuyakirin. min te jî
didît û Botan jî. Gundên Bohtan Xêrtê, Gundsêx, Hilêla, Tîrîm û Terhem
hemû ketibûn rêzê.
Ew xwezaya dewlemend û delal de Teyr li ser Tehta Mendik de difiriyan.
Erê ez mirovekî

Bohtî me, ma te dizanî belayê mohra xwe li eniya min xistibû? Lê dîsa jî
Bohtiyekî serî
netewandî bûm ez. Min raperînê fikir ji bo te. Sêrt ketibu navbera me,
ew Sêrta mirî û razayî.
Roj li ser min de derdiket û her der ronahî fikir. Li ser te jî dadiket her der
dihist nav taristanê
de. Ez li Serêzînî temaseya te û daketina rojê dikim. Min nedixwest roj
dakeve, piçekî din
ronahiyê belav bike û hawîrdor ronî bike. Li nav vê gengesiyê de ketibum
nava taristanekî res.
Piçekî din ronahî min dixwest ji dilê xwe re, erê tû û evîna te bûbû ronahî
ji bo min. Ronahiya
te mîna heyverona li nav taristanêde dihat xuyakirin. Dilê min diferikand.
Ez bi bawer bûm,
min dizanî pistî taristanê ronî ye. Lê dîsa jî veqetandin ji dilê min perçeyek
bi xwere biribû.

OXRBE YÛSV

Em li meha Remezanê de ne, wexta fitarê ye, sev e, îsev 8 tê mijdarê
(sermawez) ya
2002yan e. Roj bi giranî dadikevê, dinya sar e payîz e. Sêrt warê derd û
keseran. Sahîdê
mirinan û di dawiyê da sahidê mirina Yûsiv, westiyayî dikeve xewê. Seva
giran û westiyayî
rûnistevanên bajarê kevin û navdar Sêrtê dixwe nav hêlekana xewê û
dilorîne. Xalîçeya ji
stêrkan pêkhatî, li jor, li esmanan, bi rengên xwe yên xas ên welatê
rojhatê, li xewa seva
Sêrtê nobedarî dike.

Lê li Sêrta xwedî sê herem û heft gir a cîh û warê Asûrî, Kildanî, Cihû, Ereb
û Kurda
de malbatek ranezaye belê malbateke Bohtî, malbata Mîrhac. Xew ji wan
dure, ew dixwazin,
pir dixwazin ku razên, her tistî ji bîr bikin, deng, pêjn, hîs ji wan bi dûr
bikevin û bikevin nav
xewa bêdawîn. Lê nikarin... mirina kambax û rûres xwe li ser malbatê ve
rapêçaye. Lawikê
wan Yûsiv ku ji roja hatî dinê ve ew ji gewriya xwe ve seqet bû û êdî wî
koçî dawiyê kiribû,
dixwazin xwe bigihînin Yûsiv. Belê Yûsiv çûbû. Lê malbat xwîna wan
miçiqî, devê wan qûlf
bûyî, bê tevger û bê lebat ji hês, bîr û mejî pêve winda bune. Roj û
buyerên bihurî, gotin û
xeberdanên wî tahm û bîhnên ji bîr buyî niha yek bi yek tên ber çavên
wan. Niha vê seva sar û
kambax de dixwazin bigihin wî. Niha bi tenê hîsa winda bûne, mirov
çawan fêrî vê hîsê dibe?
Mirinê hat, Yûsiv û bedena wî bir û li pey xwe jî ev hîsa kambax xiste nav
malê û malbatê.
Vê hîsê niha mal vegirtiye. Malê resa xwe girê daye, ji roja mirinê û vir ve
ye, malî, Latîfe
xanim, zarok, nas û xizm, mirov û dost li sînê runistine. Roj bi girî dest pê
dikin û diqedin. Bi
sedan kes tên sersaxiyê. Latîfe xanim herçî ewe buye êsîra hîsên bêdeng.
Bi peyvan hîsê
dayikan nayê nivîsîn. Ew li oda rûnistinê ya mezin da runistiye. Navenda
jiyana wan a ku ew

hîn bûbûn, li erd, dîwar, têkber, xalîçe û kûrsiyên dinihêre û bêdeng
difikire ruyê wê yê bi ken
sar bûye. Çavên wî ji giriyan sor buye û rondikên wî zûwa bûne.
Yûsiv niha tûne ye, winda ye? Mirov çawan hînî winda bûn û winda kirinê
dibe? Cihê
wî yê ku her tim li ser rûdinist niha vala ye. Ken û dengê wî yê cûda di nav
dîwaran de, li
derekî vesartîne. Peyv û gotinên wî niha nayên bihîstin. Kinc, cil û bergên
wî, li hêviyêne.
Dayika wî li benda wî nexwes ketî, di nav nivînan de, li hêviyê ye. Lê ew
nayê û êdî ew tûne
ye. Ne li wê odê, ne li oda razanê, ne li ber derî, ne li ber hewsê, ne jî li tû
derekî din. Belê
seveke payîzê de, jîn û mirin ketibûn nav hev. Tû kesî nikarî bû ew ji hev
û dû veqetandina.
Cezbê mirinê bi ser her kesî de hatibû. Kesî nikaribû tovên jîyanê tê de
bidîta.
Yûsiv roja hatî dinê ve, vî êsî dikisand, rehetî û xwesiyê nedît. Wekî
hevalbendên xwe
nekarî bilîze, bigere, bixwe û vexwe. Jiyana wî ji hevalbendên wî pir cuda
bu, tim li nav cîhan
de dirêj kirî bu. Mirov perwer û rûkenîna wî dilê mirov diheland. Mirovê
ku carekî wî bidîta
careke din qet ji bîr nedikir. Hisekî bi qûwet pê re bû. Pariyeke zarok û
bîsteke can ê dayika
xwe bû. hatin û çûna wî bû yek. ji mal deng dernakeve. Mala mezin di nav
xewa sibê da,

bêdeng, li neheqiyên jiyânê difikire. Kî dê zarokê mehrûm bibe wî biso û paqij bike? Kî dê kefenekî spî û biçûk li bedena wî ya biçûk rapêçe? Bêyî hestirên çavan, kî dê bikaribe li ser wî melayika biçuk bilorîne û stranên sînê bibêje? Kî dê wî bi temamî ji jiyânê bi dûr xîne û bixe bin axa res û sar? Kî dixwaze pergî rûyê sar ê mirinê bibe, xwestekên mirinê qebûl bike.

Stuyê xwe li ber mirinê xwar bike, ji xwere nebe xweyî û bide ber sistiyê? Kî? Jiyân û zehmetiyên jiyânê li aliyekî lê ev mirin, mirina ku dora Yûsiv rapêçaye. Jiyân çiqas ecêbe. Di vê seva keser tijî de, bi ronahiya çirayeke biçuk, bi zehmetî van rêzan dinivîsim. Pirtûkên min ên dipeyvin û rêzên min ên bi girî min fahm dikin. Çi bibêjim mirin bila navê te bêbext be!!!

BAJARÊ MRÎ

Li aliyê kolanê dinêriya, ew kolana ku cîhê mesê tê da tûne bû, ew vala xuya dibû.

Tu kes ne diçû nejî dihat. Ji der û dor tu deng nedihat valahiyek ketibû dilê wî, xemgînî û

kovanên xerîb dilê wî tije kiribûn û di tirsîya, wekî ku xewna xwe de kabûsek dîtibe. Çavên

xwe bitirs girt û vekir. Lê ji vê rewsê tû mane dervedixist. Dîsa wî der û dora xwe nihêrî,

kolan, seyrangeh, rê û kuçeyên ku derdiketin kolanan gis vala bubun û li wê derê tû pêjin

nedihat. rewsa hewa yê jî çiqas diçû xera dibû. Valahî û kovanên xerîb ê
di dilê wî da mezintir
dibun, meraq, sasîtî, tirs û dilgermî têkilhev bûbûn, ecêp mayî û sas
mabû. Bêhna wî hindik
mabû biçikiya, serê wî gêj bû. Serqîniyek ji asîman belav bû bizdaha.
Destê xwe xist berîka
çakîta xwe pakîta cixareyê derxist û hebek xist devê xwe, cixara xwe pê
êxist. Mijekî kûr û
dirêj kisand, bihneke ji kezebê kisand û piçekî rehet bû. Mija cixarê
xemgînî û kovanan belav
kiribû. Bayek hat, pora wî li nav hev xist, dîsa ji ewr birûsk dadiketin erdê,
pêjna biruskê wî
ditirsand, kut kuta dilê wî bû dileriziya. Cîhê xwe de sekinî hawîrdor
temase dikir. Kesek
xuya nedibû. Ji niskave baranê dilop bi dilop lê dikir, pora wî cil û bergên
wî sil dibûn, lê ji
baranê germahiyek hîs dikir. Ji hawîrdor bîhna axê difûriya bîhneke cûda,
bîhneke xwes!!!
Baran her ku diçû xurttir dibu, der û dor di nav avê de dihist. Kolan û
kûçeyên bajêr, bi
lehiyên baranê dihatin sûstin, lehiyê pîsatiyên bajêr paqij dikir li ber avê
dibir. Kincên wî gis
sil bûbûn, pora wî, milên wî û hemû lasê wî di nav avê de mabûn, êdî
dileriziya. Destên wî
berîkê da kolan bi kolan alî mala xwe ve dimesiya. Ji bo hinekê din sil
nebe, li ber xanî û
dikanan ve dimesiya, gihîstibû serê kuçeyekî da bifilite li ber xaniyekî cas
ê kevnare de

pisîkek spî ku li ber baranê da ew jî sil bûbû, xwe gums kirî sekinîbû. Li ber pisîkê sekinî,
destê xwe avêtê û wî ji erdê hilanî kir ber milê xwe û pisîk çavekî cuda û balkês li wî dinêriya.
Tirs, tenêtî, xemgînî û jarî ji çavê pisîkê dihat xuya kirin. Ew jî wekî wî bi tenê mabû,
germahiya pisîkê hîs dikir. pisîk jî ji wê germahiyê kêfxwes bû. Baran her ku diçû xurttir dibu. Li binê Sabatek Ces de sekinîn bîhna xwe vekirin, êdî tenêtî ya mêrik çûbû. pisîk danî erdê ku cixareyekî din vexwe, lê pisîk nese kinî û ber bi kuçeyên tarî ve çû...Ew sev ji wê pisîkê zêdetir kesek xuya nedibû. Çi bûbû gelo? gelê vî bajarê kevnare ne dihat xuya kirin. Ev bajar, bajarê kevnare, bajarê westiyayî, bajarê gelên Asûrî, Ermenî û Kurda, warê Cihû, Sûryan û misilmanan, bajarê Metropolîtana Sûryaniyan. Gelo çi bûbû, çi qewimî bû, çûne kûderê, alî kîjan diyara ve koçber û penaber bûbûn; Ev bajara xweza ya xwe ve rengîn, bi mîtolojiya xwe ve dewlemend de kesek nedihat xuyakirin, çi bûbû kesekî nedizanî. Êdî xuya bu ku ev bajarê kevnare, bûbû bajarekî mirî!!!..
PÇEKÎ DN EVÎN...
Wê seva ku tû rastî min hatî, dilê min hindik mabû bisekiniya. Êdî min ji çavên xwe bawer nedikirin. Gelo ew tû bûyî an xewnekî xwesik bû, êdî çi bi min dihat min nedizanî lê

hemû lasê min dileriziya. Navê te yê xwesik, li ser zimanê min bûbû stran
diherikiya wekî ava
çemên zelal, aram û paqij. Min her û her navê te dûbare dikir. Dibe ku ez
ne layiqî wê
dilsahiyê bim, lê dîsa jî gelek xwesî min diçû. Ew roja ku ez rastî te
hatibûm, ez dil sa bûbûm.
Ji xwe tû li her demê di hisê min de bûyî. Min navê te li mejiyê xwe de
kola bû û min tim
dixwest rojekî bi tere rûnim û heya demekî dirêj bixivim...
Çiqas xetên rûyê te, bas newe hisê min dîsa jî, ez dikarim sûretê te yê
xwesik xet bi
xet çêbikim. Bihrên te, çavên te, lêvên te, pora te, gûliyên te, ew sekin û
rêveçuna te ya bi esîl
û esîrî. Li cem te tistekî din hebû kû dilê min dikisand xwe. Min bas tê
dernedixist lê min
dizanî wisa ye. Sekina te, nêrînên te, axavtina te û zîz bûna dengê te.
Taybetiyên te min tû
mirovande nedîtibû. Te aramî, xwesikî û sahiyê dida kesên li dora xwe.
Dengê te ji gûhên min
kêm nedibûn, wekî dengê stranbêjekî zîz û delal. Di hundirê min de tistên
xerîb diqewimiyan,
min nedikarî bi nav bikim, lê dîsa jî eskere bû kû min ji bo te hinek tistan
hîs dikir. Ez fahm
kirinê de dereng mam, lê gelek fikirîm. Demeke dirêj wê çawa û kengê
emê dîsa nêzikî hev û
dû bibûna. Ew temena ku di nav min û te de bûyî pirsgirêk, wisa dixuya
ku ew qet di navbera

me de derneketa. Ez niha dû qatê temenê xwe evîndarê te bûm. Bêje, ma te vî jî dizanî...

Heya berbangê di nav pirsgirêkan de difikirîm û digewizîm. Xew nediket çavên min.

Bas bû ku di nav tenêtiyekî da tû gihatî min û te destê xwe dirêjî min kiribû. Ez sipasiya te

dikim, ji bo dirêj kirina destê te yê germ. Ji bo ku hatina te hemû jiyana min gûherandibû. Te

ez ji tenêtiyê xilas kirim. Nêrîna min a jiyane û hemû hevî yên min gûherîn. Bi wê tenêtiyê da

min te li ba xwe dîtibû. Hêdî hemû kar û barê min bûbû dîtina te. Di her demê da, bi sev, bi

roj, berbangê û hemû wextî de tû dilê min da dijiya. Jiyan a min ji nû ve biskivî, ji nû ve

kûlîlk da û hevî yên mezin dilê min êsîr kiribûn. Bi tenê min dixwest ku tû bibî hevpara min.

Nizanim çima lê hemû stranên kovanî, jarî û evînî te dianî bîra min. Çavên te yên genimî,

bihrên te yên res, rûyê te yê esmer tîne bîra min. Tû wêneyên te li cem min tûnin ku, ez li ser

bedena xwe de hembêz bikim û ramûsim. Lê dîsa jî, ez na qehirim. Ji bo ku tû hemû beden a

min deyî, di serê min, hisê min û dilê min ê ku zaroktiya xwe dijî deyî. De were min rizgar

bike biksîne alî xwe ve, dîsa destê xwe yê germ dirêjî min bike de haydê ez li benda teme...

bigre erê erê bigre lê qet bernede. Bisidîne min bernede ku tû min berdî ezê li Tehta Mendik

de bikevim nav ava Bohta û perçe perçe bibim. Hemû lasê min êdî nagihe
hev û dû û êdîn
heta hetayê ez te nabînim. Evîna min, min bernede, rû heyva min, min
bernede dibêjim. Evîna
min a bedew min bibihîse. Dermanê tenêtiya min, ji jiyana xwe ya bedew
de min netave.
Wekî ku tû ji min re nebî yar jî, dîsa jî cihê min dilê xwede bi cîh bike.
Nalîna min bi hemû
bedena xwe de hîs bike. Bila xew nekeve çavên te, her û daîm bila ez di
hisê te de bim. Ji te
dipirsim ma xilas kirina xwekûstina mirovekî tistekî hindike? Ma ji hemû
bedewiyên jiyane
ne çêtire? Erê evîna min erê tû. Te ez ji mirinê rizgar kirim, te milên min
girtiye, ketime tor û
bextê te evîn, min bernede nava geremola jiyane...
Hemû evîn çawa ku tê qiset kirin û gotin ne hêsane. Evîn jar e, kovan e û
gelek
dijware. Wisa dijware ku, wekî xwê berdana ser birîneke sil û pile. Di her
bîranînê de wekî
gûlleyên bêbext, ku li dilê mirov ketibin dijware. Evîn ne rehetê, esq ne
tistekî hêsane, kengê
evîndar bixwazin bigihin hev, divê pirsgirêk derkevin. Divê bi sev û roj
binalin, jiyana wan li
nav nalîn û axîne de derbas bibe. Divê hesretê bixsînin, heya berbangana
ranezin, nekaribin bi
hevre bipeyvin. Divê her û her di navbera wan de mirovên wekî Beko
hebin. Divê her dilê

wan tijî derd û kovan be. Divê histiriyek wekî gûl bibîne û gûlek jî wekî histiriyek bibîne. Ez
ji tere tistekî bibêjim, min jî hez ji evîna bi dijwar kir, min hez ji evîna hêsanî û rehet nekir.
Divê hêstirên ji bo evînê hatiyê rijandin neçe valahiyê. Divê di nav evînê de jiyaneke din jî tû
dilê xwe de bijî mîna evîna min û te...
Heya mirinê bizanibe ku tû ji dilê min ê stûxwar dernakevî û tû dizanî ku, ji vê bûyerê
jî kesek ji min pêve pê nahese. Çiqas min êsandibe û birîndar kiribe jî ez dîsa ji vê evînê
qayîlim. Bi tenê dixwazim ev evîn bila nemire û ne yek alî be. Di paserojê de gava tû ji kûleka
evînê de birînê hemû aramî, xwesî û sahî di nav vê jiyaneke de da ku bimînin. Ez bi hew zêde çî
bibêjim. Ma qey piçek sebir, piçek hêvî û piçek xeyalê jî bilî min û te kî jê zîrarê dibîne. Ji bilî
min û te kesekî ji vê zîrar nedîtiye û em naxwazin bidin kesekî din jî. Em çibikin ku me ne
karibe ev çemên evînê ku di dilê me de diherikiyan ne sekinan dibe. Me vê evînê ji kûrahiya
dilê xwe de vesartibe, evîna me ji kîre bûye derd û elem...
Ji tera dibêjim, tû dibihîsî, evîn stûna jiyaneke... ez di nav gûnehbariya xwe de zûwa
dibim. Di sermestiya xema te de, ez ji xwe perçe dibûm. Min ji evîna xwe bêpar nehêle,
ketime tor û bextê te. Ji bo jiyana min piçekî din evîna xwe ji min teksîr neke, li benda te me,

ji te dixwazim piçekîdin evîn...

L BEHRA SPÎ PELÊN BOHTAN

Wê sevê bi dengekî bi xwe hesiyam, ji xew û xewnek sêrîn siyar bûm.

Heta

gava ku pê hesiyam, min fahm kir ku dengê tilîfona min a desta ye. Hinek wext di ser de

derbas bû. Ji nav nivînan rabûm, û min destê xwe dirêjî tilîfonê kir. Jixwe heya wê gavê, dûsê

caran zengila tilîfonê lê xistibû. Min tilîfonê girt û bersîv da, her çiqas di wê gêjiyê de min

du-sê caran deng lê kir lê, yê li ser telefonê pêjna xwe nekir û tilîfon di ser min re girt. Nimra

tilîfonê xef bû û saet li dor duduyên sevê bû. Min gelek meraq fikir ku kî di vê saeta sevê da

tilîfonê min fikir. Ji bo vê yekê jî, ez gelekî li bendê mam. Min digot dibe ku dîsa li min

bigere lê tu deng ji tilîfonê nehat û ez li bendê mam.

Gelo ew kê bû, ew bêdengiya sevê çirandibû û min ji xew û xewna sêrîn siyar kiribû?

Pirs, mereq û raman di wê sevê de li ser hev kom bûbûn. Êdî min nedikarî razê û rakevim.

Pistî demeke dirêj û bêdeng, ez derketim balkonê û min cixareyek pêxist. Hewakî sar, lê ne

cemidî li derva hebû. Asîman bi stêrkan xemilîbû û stêrka zîvîn, hîv jî, ronahiya xwe bi ser vî

bajarê razayî ve berdabû. Min him bê deng û bi meraq li hîvê temase fikir û him jî difikirîm.

Gelo ew kê bû di saet duduyên sevê de tilîfonê min kiribû? Ez hatibûm
bîra kê? Kê bû ew
kesê dixwest min ji xewê siyar bike? Bi tenê du-sê peyvên tilîfonê; "Elo,
Eloo, Elooo", ji min
bibihîse û tilîfona xwe girt. Min zehf dixwest kesê/a nepenî bizanibim bê
ka kê ye. Ez li her
kesî fikirîm û li ser vê yekê min texmîna xwe hûr û kûr kir. Erê, erê, erê
bawerke jî ew bû. Lê
ma çima ne axivî. Ma ew du-sê peyvên min ji hestên wê ra bûbûn derman
gelo, ma dilê wê
xwes bûbû? Ez nizanim... Ez li balkonê di destê min da cixareyek û bi
çavekî ji xewê nepixî li
temaseya bêdawiya asîman, sevê û stêrkên bê hejmar bûm. Heyveronê
cilê xwe yê zîvîn li
xwe kiribû û ronahiya xwe li ser bajarê qeraxê behra sipî belav kiribû. Vê
sev û heyva spehî
dîmenên rojên min ên jibîrbûyî dianî hisê min. Li peravê jibîrbûyîyan de
evîndarek bêdeng û
xef bûm. Erê ez niha bûbûm evîndar, ji bo ku ew hîv sahidê evîna min û
evîndara min bû. Min
gelek dixwest ku hîv van hestên min bigihîne yara min a nepenî...
Hêêê yarê... siyar be! Evîna min siyar be! Kûleka qesra dilê xwe ji min ra
veke. Va ye
rihê min li ber behra sipî, gazî te dike û li ser pelên hov bi baskên xwe ve
xwe digihîne te. Êdî
siyar be! Ji bo ku bêdengî, pêl li geremol û heydedana vî bajarê mezin
kiriye. Xewê bi

nepeniya xwe, rihê mirovan pêçaye. Bi tenê ez û tu siyar in. Jixwe, te min
ji xewa sêrîn siyar
kir û niha jî tu min li benda xwe dihêlî. Jixwe dilê min dîn û har bûye,
nahêle ez jî wekî her
kesî rakevîm. Axxx... çi bikim, evîn nêzîkî min dibe, lê min ji rastiya xwe jî
ewqasî bi dûr
dixe. Lê dîsa jî ez terka rastiya xwe dikim û va ye li benda tilîfona te mame.
Êdî siyar be
evîna min, bibihîse dengê dilê min ê birîndar. Dengê dilê te, dengê nefesa
te dibihîsim.
Hawara dilê te, gihat vî welatê dûr û vî bajarê li ber behra sipî. Ez ji odeyê
derketim, di destê
min de tilîfon, li balkonê, li heyverona me temase dikim. Dizanim niha tu
jî li bin hîvê û
stêrkan nobedarî. Bi min ra bipeyive evîna min, nefesa xwe û gotinên xwe
emanetê bayên
çiyayên Bohtan bike, da ku ji ser desta Mezopotamya qedîm, xwe
bigihîne heya ber behra
sipî. Bipeyive, bi awayekî eskere û bê tirs. Jixwe ez û tu û ji hîvê pê ve
keseke din nabihîse.
Jixwe sevê, hemû mirovan xistiye zindana xewê êdî ew li benda rojê ne.
Niha bi tenê ez û tu
azad in. Bîranînên min, perda jibîrbûyîne ji ber çavên min radikîn. Niha ez
bi awayekî zelal te
dibînim. Pelên bayê dîsa bilind dibin, ji welatê dûr, awazên payîzokên
Bohtiyên ji min ra
tînin. Bîhna gul û kulîlkên hewsa me tevî bayên çiyayên Bohtan dibin û ez
bîhn dikim,

radimûsim û himbêz dikim...

Êdî bû sibeh evîna min. Axir, te tilîfonê min nekir. Bila wekî te be dîsa.

Min ji te re

gotibû, li vir roj naxweyê bi tenê tîrêjên wê û ronahiya wê dibin para min,

roj ji min xeyîdiye

li vir, germahiya xwe nade min. Ez dizanim niha li Sêrtê, roj ji Serê Zînê

derdikeve, li ser dest

û çiyayên Bohtan bilind dibe û xwe digihîne bajêr. Mizgîniya rojê nû ji

were tîne. Gundî û

sênîyên Bohta ji xew radibin. Dengê banga mizgeftê gazî mirovan dike û

xweza dibe sahidê

diayên qedîm û pîroz. Dengê banga melê bi ser bajêr dikeve, pasê dor tê

dîkên gundiyan.

Jiyan dîsa dest pê dike, koçerên taxa Bitimkê û Serê Zînê pez û dewarên

xwe derdixin der.

Sivan tevî bilûra xwe serkêsiya wan dikin û dimesin. Sev, êdî tarîtiya xwe

ji ser bajar hildide

û bajar emanetê rojê nû dike. Perde ji ber kulekên xaniyên ces têne

hilkêsandin û dergehên

bi depên kevnare, ji bo jiyanek nû vedibin heya sevê. Çavên westiyayî û

rûyên bi kovan

xwiya dikin, di kolana Tillo de karker li benda karekî nû ne, êdî kolan jî, ji

mirovên bê kar

westiya ye. Karkerên kolana Tillo, jiyana xwe di serkeftina têkçûnê de hîs

dikin, ji rûyê wan ê

qemer tirs û bê hêvîti dide der. Kuçeya sûka Helewkaran, rihên çavbirçî

tije kirine. Etar dîsa

dirûtiya xwe dom dikin. Li her derî dengê hesinê sor û hewara hedadan
tê bihîstin. Li xwartir
jî, dergehên xanên kevnare vedibin. Bajar êdî dibe qada serê bazirganiyê,
kesên xwedî hêz, bê
hêz û tolaza diperçiqînin. Dewlemend, feqîr û xîzanan dimijîn, zordestiya
xwe didomînin.
Karkerên paqijiyê dikin, êdî westiyane û li qehwexanan çaya nû demgirtî
firr dikirin. Dînên
bajêr xwe sipartine kolan û kuçeyan, êdî roja nû ya Sêrtê destpê kiriye,
de haydê! Roj bas
Sêrt, roj bas hemwelatîyên min û roj bas evîna min...
Jiyan çiqas xwes e evîna min, wekî dilê evîndarekî bi germ, wekî tenbûra
hunermendekê ji dil û can û wekî awazên payizokî herikbar û zelal. Jiyan
çiqas dijwar e evîna
min, wekî min ji welatê xwe dûr, bi tena serê xwe, xerîb û penaber li vî
bajarê Behra Sipî...
Çîrokên Bajarê Xemgîn -1-
Ew roj bi serbilindî û coseke mezin me hejmarê 22 ya rojnameya xwe
Sêrta Azad derxistibû.
Li nivîsgehame ya ku her tim tijî xewn, xeyal û gotûbêjên germ dihat kirin
de, menê dest bi
belavkirina rojnamê bikira. Ji niska ve dergehê nivîsgehê vebû û mîhvanê
min Ammo Caro yê
ku cînarême yê herî kevin bû, kete hûndir. Pistî bi xwes pêswazî kirinê,
em li ser rojname û
navdarê Sêrtî ku di wê hejmarê de me li ser jiyana Mele Xelîlê Sêrtî de
nivîs wesana dibû, em

li ser piçekî axivîn. Di serî de me behsa medreseyên ku wê demê de zanîngehên Kurdistanê bûn kir. Pasê peyv peyv van vekir û Ammo Caro jî behsa zanîngehên Kurdan ku li Dêr û Manastirên hatibûn talan kirin û sewitandinê kir. Ammo Caro bi vexwarina çayê re vê çîrok û serpêhatiya ku ez jî heya dawiya temenê xwe ji bîr nekim, peyv bi peyv dest bi axaftina xwe kir û got;

Min nedizanî ev kulê dilê xwe yê ku bi salane bûyî sî û ketiye pey min û ji min re bûye wekî kabûs jî kîra bêjim. Lê madem ku te gotin vekir û te xwest, êdî wext hatiye ezê jî ji te ra bibêjim lê ez dixwazim tû van serpêhatiyên binvîsî û biwesînî da ku hûn ji vê serpêhatiyê ji xwera hinek tistan bizanibin û ji bîr nekin ku hûn kî ne, bi vî awayî jî hûn qîmeta nivîs û dîroka ku bi awayekî gemar de hatiyê vesartin derxî holê û jê sîd wergirî. Sêrt, bajarekî navenda sê herêman de maye û perçek wê di herêma Bohtan de cîh digre.

Di wî demî da hema bêje hemû Mesîhî girêdayî Dêra Keldanan bûn. Sêrt, navenda Metropolîtan û serpiskoposîya Keldanan bû. Ji hêla îdarî ve girêdayî bajarê Amedê bû. Di wê heremê da li der dora bajêr, nêzîkî sîh gûndên Keldanan hebûn. Herêm li rojava de girêdayî Tûr Abdînê û li herêma Mesîhiyên Sûryanên li rojava de dijiyan bu. Di wî demî da nêzîkî bîst

û pênc hezar bawermend girêdayî vê Metropolîtana Keldanan bû. Li gorî Piskoposiya sereke ku min pasê bihîstibû, li Sêrtê dû hezar, gûndên der dorê jî hejdeh hezar Mesihiyên Keldanî dijiyan. Ji wan gûndên Keldanî ku têda dijiyan û yên ez dizanim; Sedeq, Ginyanis, Hedîd, Ridwanê, Dehûk, Qutmis, Têl Misar, Bîngûv, Hertivinê, Bêkendê, Eyndarê, Berkê, Borem û Sernex. Her wiha çend gûndên din jî hebûn, li van gûndan de kesên Misilman û hinek kesên ji olên din jî bi awayekî biratî û astî bi hev re dijiyan. Li nav Dêr û Manastiran de hin kesên xizmetên sekreteriyê jî dikirin hebun. Ev sekreter ji alî gel ve bi her tistî ve dihatin agahî kirin. Bi vî awayî agahiyên ku distandin û berhev dikirin. Her wiha bi awayekî kronolojîk jî rêz bi rêz bi sebir dinivîsandin. Lê carna jî hinek sekreter bûyerên polîtîkên girîng de sîroveya xwe jî lê dikirin û li ser rûpelên sipî wan bûyeran ji bo paserojê nemir û ebedî dikirin. Mixabin ew kesên sîroveya xwe jî lê dikirin, dibe ku ji tirsê mirinê be an jî ji bo ku ji hinek kesan re nebin armanc, navên xwe yên rastî, li binî nedinivîsandin. Hinek kes jî sûna navê xwe, hin peyv û navên olî, erdnîgarî an jî wekî navekî lêhvûk bikartanîn. Ji ber zilm, zordarî û nezanên wê demê li gelek cihan ev Rojane û Salname gelek caran

wenda dibûn. Ji bo vê yekê jî li Dêr û Manastiran gava êrîsek li ser van kesan bihata kirin, di berî êrîsê de agahî distandin û di serî da van belge name, pirtûk û salnameyan xef dikirin. Ji bo vê yekê da ku van berhemên dîrokî û dewlemend biparêzin, gelek çaran ji cihekî koçî cihekî din dikirin. Lê carna jî rastî êrîsan dihatin û ev berhem wenda dibûn û kesên ku berheman diparastin jî ji alî êrîskaran ve dihatin kûstin. Bi vî awayî li cem van kesan çî berhem hebûna rastî wendabunê dibûn û dihatin sewitandin. Carna jî ev berhem li rêyan de an jî sikeftan de dihatin bin erd kirin û ji bo pasarojê van berhemên dirokî bi vî awayî diparastin.

Li Sêrtê taxa Ayn Salîbê (Kahniya Xaç), an jî ku wê demê bi navê taxa Keldanan ve dihat nas kirin de Pirtûkxaneyekî gelekî mezin û hêja ya Katedrala mezin a Keldanan hebû.

Ev pirtûkxane li wê heremê de a herî mezin û navdar bû. Sêrt di wî demî da navenda Metropolîtana heremê bû. Ev pirtûkxane jî aîdê Katedrala mezin bû. Di nava pirtûkxanê da gelek berhemên hêja wekî pirtûk, kovar, rojname, belge name, salname û xwedî destnivîsên gelek kevin jî bû. Besek mezin ji wan destnivîsan hê derneketibû ser rû. Her wiha pirtûkên nivîskarên Yewnanî û gelek welatên din û nivîskarên di wê demê de ku bi nav û deng bûn jî,

li vê pirtûkxanê peyda dibûn. Gelek Alim, Zanyar û Ronakbîrên wê demê
li pirtûkxanê di
salona mezin de dicivyan û gotûbêjên ilmî û zanînê dikirin. Her wiha
pirtûkxane ji alî hemû
gel û bawermendên wê demê ve jî dihat bikaranîn. Misilman, Îsewî, Êzîdî,
Sûryanî û
Keldanên wê demê ve dihat bikaranîn û hem jî bûbû cihê lêgerîn, zanist
û ilmê. Lê mixabin
bûyerek wisa qewimî ku ev sahî, xwesî, biratî û hevkarîya wê demê bi ser
neket û têkçû. Di
dawayê de ji bo ku wî demî destpêka serê qirêj bû û tahrîbatên çandî dihat
jîyîn, ev pirtûkxane
jî rastî vê êrîsê hat û ew destnivîs û pirtûkên bêhempa, ew berhemên
dewlemend hemû
hatibûn sewitandin û bûbûn xwelî.
Min pê li birînê Ammo Caro kiribû, hêrs û kerba dilê wî ji çavên wî yên ku
wekî
peykerên efsanan ku xwe li hemberî ba û bahozên dem û dewranên
bihûrî de li berxwe da be,
wisa kevnar dihat xuyakirin. Qermîçokên li ser rûyên wî dilerizî, pora wî
ya sipî û westiyayî li
hemberî temenê wî niha rabûbûn piya. Ez bêdeng li cihê xwe sas û
matbûyî lê dinêriyam û
min dixwest rewsa wê demê bifikirim. Ammo Caro ew sehpa ku li ber bû
û li ser sehpe ku av
hebû destê xwe dirêj kir û ji wê sirahiyê qedehek av vexwar. Demekî fikirî
bîhna xwe veda û

ji berîka xwe qutiya titûna qaçax deranî û awayekî hûnerî cixare dipêça.
Li nivîsgehê deng
dervediket, tenê dengê pelê cixarê û dengên têkelên ji sûkê dihatin
bihîstin bédengiyê xerab
dikirin. Cixara ku pêçabû xist devê xwe, min jî cixara wî pê êxist. Gelekî
kûr li min dinêriya,
min fam kir ku dixwaze tistekî din jî bibêje û ji bo wê yekê difikire. Min
fam kir ku
serpêhatiyên qirêj û gemar dîsa li dora wî digeriyan. Birîna wî cebirî bû û
dîsa dest bi gotinên
serpêhatiya xwe ya nepenî kir û got;
Li wan deman de ez hê zarok bûm, Sêrt bajarekî bi hizûr û aram bû. Li
heremê de
xwediyê avahiyek cûda bû. Di navbera sê heremên wekî bihûst de hatibû
avakirin. Li milekî
herêma Bohtan û li milê din ku di sedsala nozdehan de digotin dilê
Kurdistanê Xerzan û dîsa
welatê sahê Dengbêjan Evdalê Zeynikê, herêma Serhedê, Sêrt di nav van
herêman de di
erdnigariya xwe ve xwedî avahiyeke gelek taybete. Bi qesr û qonaxên
xwe yên sipî ku ji Cesê
dihat avakirin bajar dibin sipî û paqiya xwe wekî bûkekî serbixêlî dihist.
Avahiyên ku ji gelek
dûr ve jî dihatin xuyakirin dîmenên gelek xwesik radixist li ber çavan û
aramiyê dixist nava
dilê mirovan. Ji xwe ew rez û bexçeyên ku li heft girên bilindên bajêr
dorpêç kirî de kesk

dikir, xwesikiyek dida li dora bajêr, carna bi pelên bayê ve bîhneke xwes
û cûda li ser bajar
belav dikir. Fêkiyên van rezan bi taybetî jî tirê yê vî bajarî gelek navûdeng
bû. Heta li gor
riwayetek Qralîçeya Misrê Qileopatra bi taybetî ji bo vexwarina xwe,
leskerên xwe disand
Mezopotamya û bi taybetî jî bajarê Sêrtê, bi ficiyên mezin saraba Sêrtê
dibirin heya Misrê.
Carna dengê banga melayê Mizgefta Mezin û dengê zengilê Dêrê tevlihev
dibun û ev deng li
ser heft girên bilindê bajêr diketin. Wekî din dîsa li wan deman de Sêrt
navenda Zanîn û
Zanîngehên gelek nav û deng bu.
Di mehên Temmûz Tebaxa sala 1915 an de, êdî wext hatibû ew bihûst wê
biba dojeh.
Ew bihûsta ku ji dest û keda mirovan va hatibû avakirin wê dîsa ji alî destê
mirovên qirêj û
nezan ve dojehek bihata ava kirin. Temelê dojehê ji alî dewleta serdest
ve hatibû avêtin û tîr ji
kevan derketibû. Dema komkûjî û serê qirêj destpê kiribû. Bîhna serê
gemar û qirêj hêdî hêdî
dihat pozê mirovan û dem hatibû. Li Sêrtê pêsî hemû mêrên Keldaniyan
li qadekî fireh a bajêr
de berhev kirin. Wê çî bikiran, ji bo çî hatibûn berhev kirin, wan dibirin
kûderê, çî ji wan wê
bihata kirin kesekî ne dizanî û tû kesî careke din ji wan kesan tû agahî ne
stand. Pasê dest bi

berhev kirina jin û me zarokan kirin û me birin derveyî bajêr. Ez jî wekî
hemû kesî gelek
ditirsiyam û mejiyê min tije bi pirs û pirsgirêk bûbûn. Me birin li ser gira
herî bilindê bajêr
Sertehtê. Li ser serê me tevî leskeran, esqiyayên bi xwedî çek jî hebûn. Li
serê girê Sertehtê ji
mere gotin “rûnin”. Êdî hemû kes dizanî ku dawiya jiyana wan hatiye.
Hemû kes texmîn dikir
ku wê li serê wî tehtî de werin avêtin, ji bo vê yekê gelek kes bi çavekî
dilsewat ji hev xatir û
helaliya hev dixwestin. Zarok li pêşîra dayikên xwe de, êdî wê cara dawîn
tahma himbêzê
bikiran. Dayik dest bi giriyên bêdeng dikirin. Hinek esqiya û lesker di nav
hev de axaftina
xwe ya dawîn kirin û pasê yek ji wan bi alî komê ve mesiya û dest bi
axaftina xwe kir û got;
“Niha me biryar sitand ku em we nekujin, lê bi sertekî. Eger yek ji we cihê
erzaq û zewadên
ku di nava Dêrê de hatine vesartin ji mere bibêje. Em ji birçiyar perisan
mane, eger hûn cihê
zewadê zivistanê nisame bikin, em soza namûsê didin ku em yek ji we
nekûjin.” Jineke ciwan
ku ew jî li nav komê de bû rabû ser piya û got; “Ez cihê wan dizanim, ezê
ji were bibêjim”.

Dû esqiya hinek lesker, ew jinik û hinek ji komê ku ez jî têda bûm, me
xwera birin ber bi
avahiyên bajêr. Em hatin hewsar Dêrê jinik pêşî kete menzela li bin erdê
ku me jêra mehzen

digot û dergehê menzela ku di hûndirê wê de tije zewadê Dêrê hebûn
nisanî wan da. Bîhna
qedîm ji Dêrê dihat û me di dilê xwe da diayên xweyên dawî dikir. Hemû
ketibûn hûndirû û
gelek kêfxwes bûn. Li wir her cûre xwarin û vexwarinên zivistanê hebûn.
Bi taybetî ev xwarin
ji bo zivistanên dijwar û seqem dihatin hilanîn. Ji bo ku em van zewadan
hilgirin gazî me
kirin. Me dest bi kisandina zewadan dikir û derdixist li hewsa Dêrê de.
Ewan jî li nava wê
menzela din tekilhev dikirin. Me dît ku ew ficiyên ku me derxistibû hewsê
de bi taybetî ku
ficiyên tijî saraba kevnare bûn sikênandin û wan saraban rijandin erdê.
Lê ficiyên dimsê ne di
rijandin. Êdî bîhna Dêrê ya pîroz û cûda cihê xwe gûherandibû û hawîrdor
ji bîhna sarabê
salane difûriya. Yek ji esqiyayên ku di hundirû de bû, li mehzenê
dergehekî din dît ku ew diçû
menzelekî din. Qulfa dergehê pê quntara çifteya xwe vekir û kete
hûndirû, li wir pirtûkxaneya
Dêrê a bi gelek bi awayekî taybetî hatibû vesartin dît. Ji hevalên xwera
got; “werin werin li
vir pirtûkên filehan hene” pasê gazî me kirin û xwestin ku em van
pirtûkan biksînin hewsa
Dêrê. Bi seetan em bi kisandina van pirtûkan ve ma bûn, hewsa Dêrê bi
pirtûkên cûr bi cûr
tije bûbû. Gelek ji wan pirtûkan jî bi awayekî taybetî û hûnerî ku hatibûn
neqs kirin û hinek ji

wan jî cild û bergên reng kirî bun û hinek ji wan jî destnivîsên gelek
kevnare bûn. Pasê ku
min bihîstibû li wir ji sîh hezar zêdetir pirtûk û gelek dest nivîsên kevnar
û belgenameyên
hemû Dêrên heremê li wir bûn. Lesker û esqiyayan agir berdan wan
pirtûkan. Agir çiqas diçû
bilindtir dibû. Êdî dest bi avêtina mirovan dikirin di serî da pêsi bi taybetî
xwestin ku ew jina
cîh nîsanî wan dabû berdan nav agir, pasê jî ew kesên din. Êdî nalîn û
hawara jinikê feyde
nedikir. Di serî de ew jinik li ber çavên me, avêtin nava agir û pasê jî ew
kesên mayî. Bihna
sewata mirovan tevî bîhna pirtûkan bûbû, qîrîn û hawar li ser Dêrê bilind
dibû. Dîmenek wisa
dijwar û bi qabûs bû ku heya niha jî ev bûyer her û her tê xewna min û
gelek sevan ji bo vê
bûyerê min nedikarî ez bi aramî razêm û ez wek dînan lê hatibûm, min
ne dikarî û ne diwêrî
vê bûyerê bidim qiset kirin. Mirovahî mîna pirtûkan pêl bi pêl hatibû
sewitandin. Kesên ku ji
agir direviyan jî leqayî gûlleyên bêbext dibûn. Heta hemû pirtûk bûn xwelî
wan rihê me
distantin. Ji xwe êdî lesker jî û ew esqiya jî westiyabûn, ji rûyên wan
dojeh û mirin dibariya,
ew rû herdem li hisê min de, lê di nav xewn û xeyalan de tên û diçin. Ez jî
ji wan sê kesên ku
bi awayekî mûcîze ji wê bûyera res xelas bûyî me.

Pasê ku li ser wan pirtûkan min hin agahî standibû. Li gorî hinek çavkaniyan û gotina hin kesên wê demê de, li ser vê pirtûkxaneyê dewlemend de tê dîtin ku, ew destnivîsên ku hatibûn sewitandin, besa herî mezinê wan bi zimanê Garsûnî û tê gotin ku bi tîpên Sûryanî lê bi zimanê Kurdî hatibûn nivîsandin. Wisa hatibû dîtin ku, bi mirovayetiye ra, ji dewlemendiya çanda Kurdî ya herî girîng jî bûbû Xwelî... Xalê Caro êdî westiya û ez ku çavên min li ser her hevokên ku ji devê Xalê Caro derdiketin û mîna çemê Bohtan bi awayekî heybet diherikî, her hevokê Xalê Caro wekî tîrekî mirovahiyê li dilê min diketin. Ew tîr û herîkîna wan peyv û gotinan dilê min tije kîn û nefret kiribû, dilê min diqeliqiya, hindik mabû ku ez di cihê xwe de veresiyam. Ammo Caro rabû piya û xatir ji min xwest û got; te dixwest ji min re behsa alimê mezin Mele Xelîlê Sêrtî bikî. Lê min ji te re behsa pêseroj û paseroja te kir. Ew sîh hezar pirtûk û berhem ve pêseroja me jî sewitî. Îro êdî evqas çîrok û serpêhatî bese. Heya çîrok û serpêhatiyek din bi xatirê te...

– 2 -

Îro yeksema meha Tebaxê ye, Sêrt germ bûye dikele. Ez, kek Elî Zana û Ammo Caro li nivîsgeha rojname Sêrta Azad de rûnistine. Kek Elî Zana dibêje; bîhna min gelek teng bûye

Îro ne roja xebatêye, werin em herin gerê an jî herin li ber ava Bohtan
piçekî bêhna xwe vedin
û bi gotina xweya ku her tim digot “yallah yeboo hadê em herin
bikizirin...”
Em li tirimbêla xwe siwar bûn û ji sûkê jî hinek fêkî û çend qûtî jî avceha
cemed me
sitand û em çûne nav rezên hêla Dêr Mar Yaqûb. Ji xwe rezê Ammo Caro
hema li kêleka
Dêrê bi xwe bû. Em li bin siha dara fisteqê a gelekî hênik de rûnistin.
Birastî jî bîhn û bayê
xwezaya vê heremê dilê mirov diferikand û aramiyê dixist nava dilê
mirov. Min qûtiyên
avcehê jî ji tirimbêlê derxistibu û tevî wê xwezayê, avceha me ya cemed
jî lasê me hênik fikir
û ji gotineke Bohtiyân me xwe dîsa gêj fikir. Ammo Caro jî li kêleka min
rûnistî tevî cixara
xwe ya qaçax ve pê avceha cemed jî rûhê xwe xwes fikir. Ji xwe tû car
xemgînî ji rûyê wî yê
qermîçî kêm nedibû. Pistî demekî dîsa dest bi axavtina xwe ya nepenî û
serpêhatiyên xwe yên
balkês kiribû. Axavtin û serpêhatiya wî ya vêcarê li ser Dêr Mar Yaqûb
destpê kiribû. Lê wisa
dixûya ku wê Ammo Caro dîsa me bibira sed salên berê ku li bin her
kevirekî Sêrtê de
serpêhatiyek û bûyerên wî yên gelekî balkês qewîmî hebûn.
Dêr Mar Yaqub li nav rezan de hatibû ava kirin û Dêr navê xwe dabû hemû
rezên vê

heremê. Dêr ji Sêrtê pênc kilometir dûr û li ser girekî bilind hatibû ava kirin. Li wê bilindahiyê de li milekî Sêrt, Ciwanika, Eyn Baran, çiyayê Mereto û herêma Xerzan dixuya. Ji xwe hema li ber me de newalekî gelekî kûr û tûj û li nav wê newala kûr de jî ava Bohtan bi aramî û bi sebir diherikî. Li piçekî jor jî zinarekî gelekî bilind hebû ku ew jî bûbû sahidê komkûjiya, navê wê Sertehtê an jî Rasûl Hecar bû. Milê dinê ava Bohtan ku ji dûrve kesk xûya dikir, gûndên herêma Bohtan jî li wir destpê dikir. Gûndê Qûtmiş jî xwe rastî me li bin quntara wî zinarî de bû, li jor tir jî Xêrt, Sedeq destpê dikir û gûndên Bohtan wisa diketin rêzê. Hewa gelekî vekirî û zelal bû, ji bo vê yekê cihên gelekî dûr û hemû bedewiyên xwezayê jî li ber çavan bû. Dêra ku li nav vê xwezaya xwesik û bedew de hatibû ava kirin, li dijî xerabûnê gelekî li berxwe da bû û nivê Dêrê tevî çend mezelên fireh û hênik hê li ser xwe bû. Gava mirov diket hundirê Dêrê bîhneke geleke balkês û rihê mirov dixist nav aramî yê da û berî xera bûna wê dihat li ber çavê mirov. Mixabin niha jî ji alî gelek kesên nezan ve ji bo zêr û pereyên zîv dîwar û avahiyên wê li ber xerabûnê ve rû bi rû mabûn. Ev avahiya sedsalî û kevna li ber vê tehrîbatê rik girtibû û berxwedana xwe hê jî didomand.

Ammo Caro dîsa ji titûna xwe ya qaçax ku carina jê re digot keziyê keçên
zerê Elmanî,
bi awayekî hûnerî li ser pelên sipî bi sebir pêçabû û ji wê sebrê para xwe
dikêsand. Destê din
de jî avceha cemed dadiqûrtand û xwe hênik dikir. Pistî demekî aramî ku
me hem vedixwar û
hem jî bedewiya xwezayê temase dikir, Caro yê kal dawî li vê aramiyê anî
û dest bi
serpêhatiyên berê ku ewî sahidî lê kiribû kir. Min jî cixarekî pê êxist û bi
sebir, hevokên ku ji
lêhvên wî diherikîn gûhdar dikir.
Berî ava kirina Komara Tirkiyê, di navbera dewleta Osmanî û Rûsan de
ser çêdibûn. Ji
xwe di wan deman de navê dewleta Osmanî kiribûn Mirovê nexwes.
Hemû dewletên bi hêz
dixwestin perçek ji bermayiyên vî Împaratoriya ji xwere jî bistînin. Ji bo vê
yekê li hemû
deverên Împaratoriya ser hebû, talan hebû, kûstin û komkûjî hebûn. Di
nava Împaratoriya de
jî nasyonalkî Tirkîtiyekî qirêj jî destpê kiribû, bi taybetî jî ser û
komkûjiyên olî yên li dijî
misilmantiya destpê kiribû. Heremên me jî ji van komkûjiyan behra xwe
sitandibûn. Salyarê
)Walî) Wanê, Cewdet Bey xwedî artêseke bi dil bû. Meha Gulana 1915 an
de li Îranê dîsa
serê Rûs û Împaratoriya hebû. Cewdet Bey bi artêsa xwe ya bi navê
Tabûra Qesap ve têk çûbû

û ji leskerên Rûsan reviyabû. Tabûra Qesap ku wî demî de deng vedabû
berê xwe dida herêma
Bohtan. Li rê de pistî ku gihabû Bedlîsê roja 25 Hezîranê komkujiyek
gelekî mezin pêk anîbû
û hemû herem li vê komkûjiyê hesiyabûn û ji bo vê yekê gelekî ditirsiyan.
Bûyer gihatibû
Sêrtê jî, ji bo vê yekê Serpiskoposê Metropolîtana navendiya Keldanan
Adday Sêr li bajar de
li taxa Keldanan an jî Ayn Salîbê (kahniya xaç) li katedrala mezin de ji bo
vê bûyera xerab
civînek mezin pêkanî. Di civînê de, civata xwe an jî cemeeta xwe dil xwes
kir û got, em
Cewdet Bey re axivîne, 500 lireyê Tirk ji me xwestiye me vî pereyî jî daye
wan, ji bo vê yekê
bila dilê we rehet be. Em soz didin ku emê we ji vê rewsa xerab rizgar
bikin. Pistî vê bûyerê
hemû bawermend belav bûbûn û her kes çûbû ser karê xwe. Lê pistî vê
civînê bi demekî din,
leskerên Osmanî ketibûn mala Serpîskopos Adday Sêr û xwestibûn wî
bigrin û bikûjin lê
Adday Sêr ji destê wan karîbû bireve û xwe ji wan xelas kiribû. Adday Sêr
ji Sêrtê revîbû xwe
parastibû axayê gundê Tanzê, Osman axayê Tanzêyî cilekî din lê kiribû û
wî li gûndê xwe de
diparast. Pistî ku Adday Sêr ji leskerên Osmanî û ji hikûmetê revî, ev rews
jî ji leskeran re
bûbû sebaba lêgerîn û komkûjiya Keldanan.

Ammo Caro piçekî bîhna xwe veda, ez û Eli Zana çavên me lê, em bédeng mayî lê
temase dikin û her gotinên ku ji devê wî derdiketin me dibihîst û em jî diketin nav vê
serpêhatî û rewsa xerab de. Qûtiyên avcehê vala bûbûn, min sê qûtiyên din jî vekir û ji cixara
xwe îkramê wan kir, ji xwere jî hebekî pê êxist û li cihê xwe de rûnistim. Elî Zana ji xwe qet
nediavî, ez bawerim dîsa pirsgirêkên wî yên malbatî dilê wî êsandibûn, lê ez texmîn nakim
ku çi bibe û bi qewime jî wekî vê serpêhatiya Ammo Caro nikare xemgîniyê bixe dilê mirov.
Ammo Caro li deverên gelek dûr dinêrî, ji ber ku ji van bûyeran gelekî êsabû, çavên wiyên
genimî û kal gelekî kûr û dûr bûbûn. Ji nîskave dîsa dest bi axavtina xwe kir û domand.
Ev rews bûbû sebaba lêgerînek bi xwînî ya taxa Keldanan. Vî lêgerîna bi xwînî,
mûtasarrifê xwînmij Hîlmî Beg destpê kiribû û ev rews ji bo wî bûbû fersendek gelekî mezin.
Femandarê Cendirma Hamdî Beg û Serokê Saredariya Sêrtê ê pêsi Hamî Efendî jî pistgiriyeke
mezin dabûn Hilmî Beg. Di wan rojan de gelekî mêrên Keldanan bi awayekî hovane, li malên
xwe de, li ber zarokên xwe de hatibûn kûstin. Gelek Keseyên gûndên Keldanan ku ew roj
hatibûn civînê û wê rojê li katedralê bûn, ew hemû li mala Xwedê de hatibûn kûstin. Bûyereke

wisa hovane bû ku ji komkûjiya Ermenan ne kêmtir bû. Li vê komkûjiya
Keldanan Hilmî Beg
li ber kûleka qesra xwe, bi dilxwesî lê temase dikir. Keldanên ku ji vê
komkûjiyê nemirîn û
dijiyên êdî ne diwêriyan ji mala xwe derkevin der. Lê êdî dest bi xaniyên
wan jî kiribûn,
diketin kijan xaniyê talan dikirin, dikûstin û bermayiyên disewitandin.
Hemû mesihiyên
Keldanên li gûndê Mar Yaqûb jî hatibûn kûstin. Hinek Meleyên ku ji
Mutasarrif Hilmî Beg
pere wergirtiyan an jî ku di vê talan kirinê de hevpar bûn, li mizgeftan ji
bo vê komkûjiyê
dilxwesiya xwe dianîn ziman û ji bo carekedin tû mesîhî ne êxin li nava
Sêrtê de sond
dixwarin û gel ji bo van weez û sîretan tehrîk dikirin.
Roj çûbû ava û sevê hêdî hêdî qirasê xwe yî res li ser Sêrt û heremê da
berda bû. Stêrk
êdî derdiketin, çiya û ava Bohtan di nav wê resahiyê de hêdî hêdî wenda
dibûn, ji xwe avceha
me jî xelas bûbû û êdî em yê rabûnê bûn. Em her sê li tirimbêla xwe siwar
bûn û tevî mûzika
Eyaz Yûsivê Zaxoyî ku ew strana wî ya “Gûlek tenê Besî mine” ku gelekî
min jê hezdikir, me
gûhdar dikir û em ber bi Sêrtê ve tevî tirimbêlê em bi rê diketin. Sêrta
xwesik ku bûbû sahidê
van bûyerên qirêj, bêdeng mayî ber bi xewa sevê ve bi aramî diherikî û
diket xewa nazenîna
heya rojeke din.

- 3 -

Ez û Remezan li wê seva havînê de em çûbûn mala Xaleta Berfê. Xaleta Berfê di demekî de cînarê me bû û ji eslê xwe ji gûndê Qalendera bû. Her wiha dims, mewîj û xelîlên vî gûndî, ji ber ku her dem ji Xaleta Berfê re ji gûnd dihat û behra min jî tê de hebû, ji bo wê yekê jî ez dizanim gelekî navdar bû. Hê di wan deman de ez zarok bûm, her û daîm diçûm mala wan û min mewîj dixwar, Xaleta Berfê jî ji min re çîrokên xwe yên herî sipehî digotin. Lê ez gelek caran diketim nav çîrokan û diketim nav xewên sêrîn, gelek caran ez li nav himbêza Xaleta Berfê de razayî mabûm. Helbet ji wê germahiya dilê wê, min jî wekî dayika xwe jê hez dikir. Lê niha ew gelekî pîr bûye, taqeta wî nemaye û nexwese, ji bo vê yekê ez û nûçegihanê rojnama me Sêrta Azad Remezan Oktay me serîkî li mala Xaleta Berfê da. Li hewsaxanî de, li ser text an jî somyê dirêj kirî û li bin betanîkî sipî de bû. Gava çavên wî li min ket hêdîka rabû ser xwe û ez jî çûm destê wî min ramûsa. Çavên wî tije bûbûn, ji ber ku nedixwest bi vî halî derkeve pêsberî min. Çavên wî yên bi girî, min jî êxistibû nav kovanê û rondik ji çavên min jî hêdî hêdî hatin xwar. Min nedikarî ez xwe bigrim, çavên min jî tije bû

bûn, min ji Remezan serm dikir ku bigrîm, lê dîsa jî min nekarî hêrsên xwe
û ez bi awayekî
fediyokî giriyam. Heya demekî em giriyan pasê min rondik û hêstirên çavê
xwe paqij kir û me
dest bi axaftina xwe kir.
Ewî got tû çawanî, min got, ez basim, min got tû çawanî ewî jî got, ez jî
basim,
mixabin ne ew bas bû û ne jî ez, birîna me gelekî kûr bû, me nedikarî em
bînin ser ziman û
biherikînin. Li hundirê hewsê de kovan digeriya û ketibû hemû bedena
me. Em gelekî xemgîn
bûbûn, lê pistî demekî rews piçekî gûherî û aramî ket dilê me û gotin li
ser çîrokan vebûbûn.
Ji xwe di wan rojan de, me li ser navê Rojnamê pêsbaziyekî çîrokan li dar
xistibû.
Gelek afîsên bi Kurdî me li nava bajarê Sêrtê de daliqandibû. Ji ber ku ev
cara yekemîn bû ku
li nava Sêrtê de afîsên bi Kurdî hatibûn daliqandin, ji bo vê yekê jî ev afîs
ketibûn rojewa
Sêrtê. Her kes li ser afîs, çîrok û rojnamê diaxivî. Xaleta Berfê jî ji vê
Pêsbaziya Zargotina
Kurdî hesiyabû, ji ber ku vê pêsbaziyê min li dar xistibû jî, gelekî dil xwes
bûbû û gotibû
“Memê rûken gelekî qenc kiriye.” Ji xwe piçûkatiyê ve ji min re digot
Memê û niha jî ez ji bo
wî dîsa Memê biçûk bûm. Di wan demên berê de jî Xaleta Berfê her dem
ji min re giringiya

çîrok, çand û zimanê Kurdî dianî ziman. Di nav gelê Sêrtê de rojewa
çîrokên Kurdî destpê
kiribû û lêgerîn destpê kiribû, ji bo vê yekê jî dilxwes bûbû. Wê sevê jî
dîsa li ser girîngiya
zargotin, çand û hûnera Kurdî de gelekî axivî û ji bo vê xebatê jî me pîroz
kir. Di xwest
pistgiriye bide me û got;
Ez jî dixwazim besdarî vê pêsbaziyê bibim, lê ez nikarim binivîsim, ji bo vê
yekê ezê
bêjim û hûn jî binivîsin. Ji xwe em ji doh ve jî qayîl bûn ku ew ji mere
çîrokekî bibêje. Lê ji
ber nexwesiya wî ez jî Remezan jî em gelekî ditirsiyan. Xaleta Berfê; ezê
îsev çîrokekî herî
dijwar, dilsewat û balkês bêjim, a rastî ev çîrok serpêhatiye. Serpêhatiya
min û jinekî Keldane
ku piçûkatiyê de keça wî hevala min a herî bi taybet bû. Beriya wexta
xelayê ji Sêrtê hatibûn
Sîrgûn kirin. Pistî sîrgûnê min gelekî pîrsa wan kiribû û di dema sîrgûnê
de tistên gelekî xirab
hatibûn serê wan. Rêhevalekî wan ji min re qiset kiribû, ezê jî ji devê jinikê
bûyera wan ji
were bibêjim. Lê di serî de ez dixwazim piçekî behsa wê û hevaltiya me jî
bikim.
Navê hevala min Celîla bû, ew Mesîhî bûn. Navê bavê wî Mûsayê Corkis
bû, navê
dayika wî jî Rabî Nano bû, lê min ji dayika wîra digot dayê Nano. Lê ji vê
navê qet aciz

nedibû, bêtir kêyfa wî ji min re dihat. Dayika Nano çiqas min bidîta, hêjîr,
qizwan û mewîj
didan min. Carna jî ji bo me serbetek gelekî xwes çêdikir, min û Celilayê
me serbeta xwe
vedixwar û li hewsaya mala wan de me ji xwere dileyist. Em ji gûndê
Qelenderê hatibûn Sêrtê
çawa ku dayika min digot ji xwe deh sal hebû ku em koçberî Sêrtê bûbûn.
Li gûndê me
Qelendera de li nav gûndiyan hin bûyer qewimîbûn, ji bo vê yekê bavê
min jî mala me anîbû
Sêrtê û em li wir bi cîh bûbûn.
Min û Celila me gelekî hez ji hev dikir, tû roj tûnebû ku me hev nedîta, di
navbera me de
têkiliyekî gelekî germ hebû. Berî veqetandina min û Celilayê li Sêrtê gelek
bûyer diqewimîn
ku me nedizanî çî dibe, bi tenê ji rûyê mirovan tirs dihat xûyakirin. Beriya
wê rojê ez dîsa li
mala Dayê Nano bûm, ez û Celilayê li hewsaya xaniyên wanê Ces de, me ji
xwere dileyist. Bavê
Celilayê wê rojê hê zû hatibû mal û dergehê xaniyê wanê texte, bi dengê
serqîniyekî bilind
hatibû vekirin. Ez û Celîla li hewsê da gelekî tirsîya bûn, bavê wî bi lez
hate hûndir û gazî
dayê Nano kir û jêra got li bajarê Bilîsê bawermendên me ji alî Tabûra
Qesap ve hatine kûstin
û Tabûr berê xwe daye herêma Bohtan. Ez wisa bawerim ku em neçin wê
me jî li vir bikûjin.

Rûyê bavê Celilayê ji tirsan zer bûbû û me jî gelekî tirsan dibû. Ji xwe dayika Nano gava vê bûyerê bihîst, ev tasika kevirê desta de ku tijî qizwan û mewîj bûn kete erdê û tev rijîyan erdê belav bûn. Me ji tirsan dev ji lîstika xwe berda û me wan temase dikir. Bavê wî di cihê xwe de ne disekinî li nava hewsê da diçû û dihat, kuf kufa devê wî bû, ji hêlekî va difikirî û ji hêla din ve jî ketibû nav derdekî bê derman. Pistî demekî ku êdî bûbû êvar, xatir min ji wan xwest û vegeriyam malê. Ji xwe roja din dayik û bavê min ku ew jî gelekî ditirsiyan, nehistin ez herim mala Celilayê. Min nedizanî wê çî bibe, çî biqewime bi tenê tirs hebû, her kes ditirsiya, ew roj ji Sêrtê dengê lesker û tivingan, pasê jî qêrîn û nalînên mirovan tevlî van dengên bûbûn. Lê min nedizanî çî diqewime, bavê min jî ew roj neçûbû kar. Ji xwe ew her sibeh zû ji xew radibû, cilên xwe yên kar li xwe dikir û Hêstira xwe siwar dibû û diçû Serêzînî li ocaxa Cesê. Li nava ocaxê de dixebitiya, Cesê ku hatibû amadekirin, li hêstira xwe bar dikir û dibir bajêr. Kesên ku ji xwere xanî an jî Qesr ava bikiran gazî bavê min dikirin ewî jî ji wan re Cesê dikisand. Lê ji ber ku li ocaxê herdem toz û dûman kêm nedibû, bavê min jî gava dihat mal cilên li ser sipî, rûyê wî, pora wî, li nav toza cesê

diman û sipî dikir. Lê hê nehatî mal dayika min jî bîra di hewsa me de avê
derdixist û dixist
qazanê û li ser tifikê germ dikir. Bavê min pêşî pê wê avê li sersokê serê
xwe disûst û pasê jî
dihat ser sifrê xwarin dixwar. Lê wê rojê bavê min jî neçûbû karê xwe, li
hewsa malê de
rûnistî difikiriya.
Ez jî êdî tirsîya bûm, lê dîsa jî min mereq dikir ka li derve çi diqewime. Ji
bo vê yekê
jî ez çûm ber kûleka xênî û min kûçeyên teng temase dikir. Lesker li
kûçeyan diçûn û dihatin
carna jî hinek kesên din bi xwere dibirin. Destê hinekan ji pasve hatibû
girêdan û hinek kes jî
cilên qirêj û qetiyayî ve tevî leskeran diçûn cihekî. Dayik û bavê min li
hewsê da rûnistibûn û
bavêmin digot; Xanim Fermana Mesîhiyan hatiye sitandin wê gelekî xwîn
biherike, heyfa van
mirovan xanim. Ji dest tistekî nayê xatûn ev fermana Osmaniyan, ev
fermana Osmaniyan”!
min nedizanî ferman çiyê, Osmanî kî ne, xwîn çawa diherike. Lê ji ber ku
hemû kes ditirsîya
û min jî ne careke din ne Celilayê dîtibû û ne jî dayika Nano, ji bo vê yekê
ev gotin ji gûhên
min qet dervediketin.
Ez dîsa çûm ber kûlekê min dît ku dîsa sûwariyek ji destê yekî pê benikê
girêdayê û
tevî hespê xwe mêrik jî bi xwe ve dikisîne. Lê ew çi bû? min wî kesê ku ji
dest hatibû girêdan

nas fikir, erê erê ew bavê Celilayê bû. Min serê xwe ji kûlekê dirêj kir û gazî xalê Mûsa kir.

Lê min nebihîst, min dîsa gazî kir û got Xalê Mûsa! Xalê Mûsa. Vê carê min bihîst, ji niska ve berê xwe da kûlekê, rûyê wî sor bûbû û hêstir ji çavên wî diherikî, digiriya. Xalê Mûsa bi demekî sekinî û çawa ku ji min xatir bixwaze, bi çavekî xemgînî li min nêrî. Min ji çavên wî tê derxist ku ferman an jî Osmanî ne tistekî bas û ya xêrê bû. Leskerê ku Xalê Mûsa bi xwere dibir, berê xwe zivirand û dîsa Xalê Mûsa bi alî xweve kisand û ji wê kûçeya meya teng bi dûr bû û çû. Lê çav û rûyên Xalê Mûsa neyê xêrê bûn. ez ji kûlekê hatim xwar û dîmena ku min dîtibû hal û rewsa Xalê Mûsa ez her tim difikiriyam. Ez dîsa çûm li cem bavê xwe û min jêra got; Xalê Mûsa hespekî ve xwe girêdabû û diçû, min gazî wî kir, min got were mala me, lê qet xeber neda lê digiriya, çav û rûyê wî sor bûbû bavo. Tevî van gotinên min bavê min jî dest bi giriyê kir û got Xalê Mûsa çû cihekî dûr keça min, êdî ji wir nayê. Mi jî ji bavê xwere got; bavo em herin mala Celilayê, em herin ba Dayê Nano, niha Dayê Nano serbet çêkiriye, em herin, em herin” lê bavê min qet gûh nedida min ew roj li ser çokê bavê xwe ez giriyabûm û di xew de çûbûm. Heya sê çar rojan, bav û dayika min nehistin ez ji mal derkevim. Pistî

çend rojêke din ez çûm mala Celilayê lê ne Celila hebû ne jî Dayika Nano.
Leskerekî xwedî
simbêlên dirêj, derî vekir û ji min re got ji vir here nexwe wê Kûçikê min
te bixwe. Ez
tirsiyabûm pistî wê rojê êdî ez qet neçûm mala wan, lê min her ji dûrve,
Xaniyê wan temase
dikir. Celila Dayika Nano û Xalê Mûsa ku hatibû girêdan û ferman û
Osmanî pistî vê bûyerê
min qet ji bîr nekirin.
Xaleta Berfê westiya, qedehek av vexwar. Min û Remezan me wî gûhdar
dikir û
fêkiyên ku keça Xaleta Berfê ku navê wê jî Celile bû anîbû li ber me, me
dixwar. Wê sevê
stêrk û asîman gelekî xwesik xûya dikirin. Heyverona sipî û pak merhemet
û aramî xistibû
dilême, em gelekî xemgîn û bêdeng kiribûn. Ji niska ve deriyê hewsa wan
vebû, cînarê wan
Xalê Behrî û Sosin xanim hatibûn. Ew jî hatibûn cem Xaleta Berfê, da
rewsa wî bipirsin. Li
ser text rûnistin û wan jî gûhdida qisetan. Xaleta Berfê pistî demekî dîsa
dest bi axaftina xwe
kir û domand. Pistî van bûyeran hevaleyê Dayika Nano van serpêhatiyên
Celila û Dayika
Nano ji min re gotibû, ezê jî vê serpêhatiyê ji devê wan kesan ji tere
bibêjim.
“Meha Temmûzê sibehekî roja yeksemê bû, me jin û zarokan anîbûn
bexçê leskeriyê.

Wê sevê em li bexçê de rêz kirî, li bin wê hewayê hênîk de di xew de çûbûn. Sibeha roja din,
me hemû yan berî çend rojan ku mêrên Keldanan jî li wir civan di bûn û biri bûn hewsê
nexwesxanê. Li wir, li ser rûpelekî navên me nivîsandin. Lê pistî destpêka sirgûnên Bilîsê de,
me jî dest bi mesê kiribû. Koma me li ser hezar kesî ra hebû. Jin, keçên ciwan û zarokên ku
temenê wan jî kêmî panzdeh ve pêk dihat bi tenê çend zarokên duwazdeh anjî deh salî jî
hebûn. Me hinek alav û têkberên xwe bi taybetî jî betanî û nivînên xwe jî bi xwere anîbûn. Bi
mere çar cenderme jî hatibûn û em hemû bi hev re dimesiyan.
Kesên ku di rê de diwestiyan û disekinîn, bi taybetî jî kal û pîrên ku ne dikarin bimesin
cîh da li wir dihatin kûstin. Em li gûndê Kêzerê êrîsî esqiyayan ku hevparê leskeran bûn hatin.
Ketin nav me cilên me dirandin, xwarin û perên me dizîn. Li newalekî de, cendirmeyan me rêz
kirin. Yek û yekû cilên li ser me êxistin, pere gûstil, gûhar û hemû bazinên me, ji me sitandin.
Gava me li derekî li bêhna xwe vedida, diketin nava komame, jin û keçên herî sipehî
dibirin û li wan newalan de tecawuzê wan dikirin. Kesên li ber xwe didan dihatin kûstin.
Gelek ji wan kesan hatin kûstin. Li nav van kesan de mirov û xismên min jî hebûn. Pistî sê

rojê din Cendirme Tahir Çawis hate cem min û keça mina hê hest salî
Celilayê xwest. Ez li
ber wî rabûm û min got min bikûje keça min ji min nestîne. Lê ji min re
got ne hewceye tû
bitirsî, wê keça te li ba min rehet bike. Lê heya demekî dîsa bi sax û
selamet tû dikarî wî bibî
li cem xwe. Min çiqas li ber xwe da jî feyde nekir. Tahir Çawis keça min
Celilayê hespê xwe
siwar kir û gûh neda qêrîn, girî û hawara min, keça min girt û bir, ji wir
dûr bû û çû.
Bi rojan em mesiyar, em ji gelek gûndan derbas bûn. gelek jinan zarokên
xwe di
himbêza xwe de hildigirtin. Tava rojê a germ me disewitand. Bi
derbasbûna çiyakî da, hin jin
û mêrên wan gûndan, çav berda bûn telîs û çeltikên me. Nêzîkî sed kesên
xwedî çekên giran,
êrîsî me kirin. Me birin desta Vavelê û wekî zihakî li wê destê de êrîsî me
kirin. Jinên wan jî
kevirên mezin davêtin me. Cilên me ji me êxistin birin. Yekî çav berda bû
çakît û sola min.
Nêzîkî min bû û bi zorê ji min sitand û kûlmekî gelekî giran jî li min xist.
Min gelek dixwest
ji wir bi revim lê beriya min de jineke din revîbû û bi derbên xencerê
birîndar bûbû. Ûr û
rûviyên wê yên ji zik derketî, dixwest dîsa bêxe hundirê zikê xwe. Sir sira
xwîna wê bû
diherikiya û îska mirinê dida. Wê xwestibû bireve lê ji derba xencerê
nekaribû xilas bibe. Ji

bo wê yekê jî min ne di wêriya ez birevim. Xwarziyê minê biçûk jî di himbêza min debû.

Jinbira min jî kûrê xweyê sê salî Fûad xistibû himbêza xwe û em qedera xwere rû bi rû mabûn.

Koma zaliman li wê destê ketibûn rêzê û di pey me de dihatin. Em westiyayî û ji tirs

wan ketibûn wê erdê. Hemû bedena min dilerizî. Hema di wê gavê de yekê keçeke ciwan

girtibû û bi xwe ve dixiriqand. Ew keçik Sayûdê keça Petros Çakayê Kese bû. Ew kesê zalim

hate cem min û pirsî “Tû keçî an jinî? Min got ma tû zarokê min nabînî”. Hema wexta

vegeriya li cem min, dengê cendirmeyek hat û digot; “Jina nebin bikûjin, bi tenê keçên ciwan

bibin.” Ew kes diqîriya û digot diyariya min keçeke ciwan e. Min xwest rabim li ser xwe û ji

wir birevim. Lê ewî kesî ji erdê kevirekî mezin hilda û ji pas ve li min xist. Kevir li serê min

ketibû, dîsa ketibûm erdê û nêzîkî niv seetê ez ji xweve çûbûm.

Giriyê wî zarokê ku di hîmbêza min de bû min siyar kir û ser xwe ve anî. Zarok li bin

germahiya rojê de razabû, hema bêje heliyabû. Kûl û êsên wî gûnehî dikisand û nêrînên çavên

wî yên xemgîn dilêmin qeqilan di bû. Min zarok hilda û bedena wiya biçûk xist himbêza xwe

û li bin siha darekî de rûnistim. Destê xwe min bir serê xwe, hê jî ji serê min xwîn diherikiya.

Gelek jinên wan gûndiyan destê wan de têlîs û hacetên diziyê li ber min de derbas bûn. Gava min dîtî wiha gotin “Waye yekî din hê nemiriye, em cilên wê jê bistînin” yek ji wan hat û gora lingê min de kisand, lê lingên min werimî bûn û xwîna li ser gorê ku hisk bûbû ji bo vê yekê jî ji lingên min dernediketî ji xwe wê jî nekarî derîne û dev ji min berda û çû li ser riya xwe. Pasê çar kesê din hatin ba min û xwestin min bikûjin lê zilamekî kal hat, nehîst min bikûjin. Pistî ew çar mêrik çûn, zilamê kal min tesellî kir û xwest min bibe mala xwe. Lê ji bo vê yekê jî diviya min hinek pere bidayê. Min jêre got hemû tistên min hatin dizîn. Zarokê li ber singa min nêrî û dilê wî mabû wî zarokê bê gûneh ve. Zilamê kal êlekê xwe êxist û da min û got; “pê vî êlekî zarok bi pêçe û li vir bisekine, ezê demekî din werim” pistî demekî hat û min bir gûndê xwe yê nêzîkî Mêrdînê. Jina wî zilamê kal çend rojekê li min nêrî. Pistî birîna min bas bû, çî karê ji dest min bihata min ji wan re fikir û min gelek sipasiya xwe ji wan re kir.

Metekî min li Mêrdînê rûdinist, min gelek dixwest biçûma cem wan. Pistî demekî din, li gûnd rastî jineke Asûrî Keldanî ku ew jî ji Sêrtê sirgûn bûbû hatim. Wê ji min re got

dûwazdeh jinên din re em dixwazin herin Mêrdînê. Ji bo vê yekê ez dil
xwes bûm û min ew
kesê kal re got; ez dixwazim herim Mêrdînê ji bo vê yekê ji we destûrê
dixwazim. Pasê tevî
çend jinên gûndî re li piya em çûn Mêrdînê. Min mirovên xwe dîtîn, pasê
jî bi hinek peran
min keça xwe Celilayê ji wan zaliman xilas kir. Pistî saleke din çûyîna
Helebê derket holê, ez
jî çûm û tevî xwarziyê xwe bi cîh bûm”.

Xaleta Berfê me xemgîn kiribû, Sosin Xanim û Xalê Behrî jî, ji vê komkûjî
û wexta
Xelayê de hinek tistan bihîstibûn. Ji xwe gotin, gotinê vekiribû. Em li wê
hewsa hênîk de
bûbûn rêwiyên demên berî hestih salê û çûbûn nava komkûjî, ser û
kûstînan de. Sosin Xanim
pistî çîroka Xaleta Berfê, xwest ew jî li ser van bûyeran de çîrokekî bibêje.
Çîroka wê
Serpêhatiya Xaleta Hanayê Sêrtî bû. Xaleta Hana jî ji fermana Asûrî
Keldaniyan de, bi siklekî
mûcîze xelas bûye.

– 4 -

Sosin xanim vê serpêhatiya wê nêzîkî sih çil sal berê jê bihîstiya û dibêje.
Xaleta Hana
rehma xwedê li ser gora wê be, gelekî ês kisandibû. Ew cînarê me bû, pistî
sirgûnê dîsa
vegeriya bû Sêrtê û xwestibû li ser axa xwe de bimre. Xaleta Hanna dayika
Siltanê me yê

Sêrtî ye. Me bi wanre cinartiyekî gelekî bas kiribû, wexta xwarin bihatan çêkirin, tebaqên
xwarinê di navbera mala me û mala wan de diçûn û dihatin. Rojên xwesî
û resahiyê de jî em
her dem li ba hev bûn. di navbera me de têkiliyekî gelekî germ û
hevaltiyekî gelekî bas çê
bûbû. Hê ne çû yî rehma xwedê, dîsa sevekî ku em mîhvanê wan bûn û
gotin li ser Xelayê û
Fermana Osmaniyan vebû bû. Ji mere vê serpêhatiya xwe qiset kiribû.
Di destpêkê de mêrên ku hatibûn girtin, li hewsa leskeriyê de hatibûn
berhev kirin. Ji
wan xwestibûn cilên xwe bêxin û pasê wan biribûn desta Zeryebê. Li wir
ji alî hêzên mîlîsan
ve hatibûn kûstin. Li nav wan mîlîsan de gelek kesên diz û esqiya hebûn.
Hinek mêrên me yên
ciwan, ji bo vê komkûjîyê xilas bibin xwe li xanî û kavilan de xef kiribûn,
an jî cilên jinan li
xwe kiribûn. Lê gelek ji wan hatibûn girtin. Ji dest û piyan ve hatibûn
girêdan, lingê wan
hespa ve girê dabûn û li kolan û kûçeyên bajêr de dixiriqan din ku heta
hatibûn kûstin. Hinek
jin derketibûn li banê xaniyên xwe û ji wir xwe amadeya parastinê dikirin.
Ji bo êrîsan xwe
biparêzin 30-40 kes kom dibûn. Rojekî leskeran hemû zarokên 6 û 15 salî
berhev kirin û wan
birin qereqola polîsan. Ji wir jî birin cihekî çîyayî ku jêra me digot Ser tehtê
(Rasûl Hecar) ê û

li wir ew zarokên bê gûneh hatin kûstin û lasê wan li wê tehta bilind de hatin avêtin.

Pistî vê bûyerê çend rojek din, li ber hemû xaniyên taxa me nobedar hatibûn bi cîh

kirin da ku kesek ji mala xwe dernekeve. Ji me re gotibûn çend rojekî de emê we bisînin

sirgûnê. Çend rojekî din dû nûnerên hikûmetê hatin û kesên ku bihatan rêkirin dest bi

nivîsandina navê wan kirin û lîsteyan amadekirin. Serê kesekî qûrîsek û nîv perê Tirk dihat

dayîn. Pistî vê yekê jî ji me re gotin emê rê de jî ji bo her rojekî qurîsek û nîv din jî bidin we.

Mixabin dixwestin ku hejmara wan kesên ku bihatan sirgûn kirin derxin holê. Bi vî awayî jî

kesekî êdî xwe xef ne dikir û ne direvî. Pênç rojên din dora qafila me hatibû û em ketin rê.

Di rê de qafila kesên ku pêsiya me de çûyîn û hatiyîn kûstin me di dît. Lasê wan li wan

deran raxistî û piraniya wan jî jin û zarok bûn. Leskeran xwarin ne didan me, gava em ji çem

û rûbaran derbas dibûn, destûr nedidan û ne dihistin em avê vexwin. Gava bû sev, me li dest û

newalan de bêhna xwe vedida. Lê lesker di destê wan de çira û find, li rûyê kesên ku radizan

dinêrîn. Dest bi lêgerîna keçikên ciwan dikirin. Ji nav komê çend keçikan birin, tecawûzê wan

kirin û pasê jî teslîmî esqiyayan dikirin. Di rê da 200 keçikên ciwan hatibûn kûstin.

Min çawisekî Tirk li hemberî perekî mezin ikna kiribû ku destûrê çûnê bida me. Ez û
keça xwe emê biçûna gûndê Têlanê li cem Sêx Aso. Ses jinên din jî pere dabûn Çawûs da
destûrê çûyînê bida. Çawûs pistî demekî destûrê da me û em ketin rê. Nêzîkî girekî bilind,
hinek kes hêviya me bûn. Nêzîkî bîst kes tê hebûn, di nav wan de hinek jin jî hebûn. Da ku em
herin cem wan gazî me dikirin û digotin “werin werin emê we bibin gûnd” lê gava em nêzîkî
wan bûn, hemû bi hev re êrîsî me kirin. Hemû tistên me ji me dizîn, heta cilên li ser me jî
birin. Li wê derê em nîv tazî mabûn. Ew dikeniyar û digotin “Niha hûn dikarin herin cem Sêx
Aso.”
Pistî demekî du kes hatin cem me, li ber çavên me xwe avêtin ser sê keçikên ciwan û
tecawûzê wan kirin. Pistî ew kes çûn, em nîv tazî li serê xwe mabûn, kesekî nedizanî emê
çawa herin gûnd. Roja din sivanekî Kurd me dît, hate cem me û pasê me bire gûndê Têlanê
cem Sêx Aso. Sêx li halê me gelekî sewitî. Pêşî ji mere xwarin anîn û pasê dew anîn me
vexwar. Ji bo em xwe bi nixwimîn sê çar perçe cil ji me re anîn. Lê Sêx Aso got ez gelek
dixwazim alîkariya we bikim lê ez nikarim we zêde xef bikim. Lê me sand gûndê ku Asûrî

Keldanî jî li wir dijiyan, gûndê Bêkendê. Ji bo me biparêzin Sêx çar kesan
bi me re rêkir lê
got “ji bo we nekûjin hinek pere bidin wan” di rê da Halleya keça Îsa
Horre, ji alî esqiyakî ve
bi xencerê hate kûstin. Li Bêkendê me birin mala Amînayê. Amîna berê
mesîhî bû, derbasî
misilmantiyê bûbû. Amîna pere da ew kesên bi me re hatibûn. Pasê me li
êxûrê de xef kir.
Mêrê wê sofî Hemze çûbû leskeriyê.
Lê hê gelek wext derbas nebûyî, cîran li me hesiyabûn û diviya em biçûna
cem
Mûxtarê gûnd. Çar cenderme hatibûn, wê me bibirana cihê Keldanên
Bêkendî ku hatibûn
kûstin. Li wir wê me jî bikûstan. Tistên hatibûn serê me, me helandibû.
Em ketibûn halekî
wisa de ku kesek, ji bo me merhemet û dilovaniyê nedixwest, dilê kesekî
li me ne disewitiya.
Ji xwe mirin xilasiya me bû, ji bo vê yekê jî kesek ji me ne ditirsiya. Bi
zarokan re em hest
kes bûn. Êdî tevî cendermeyan, em diçûn cihê kûstinê. Em çend seetek
mesiyabûn. Di wê
navberê de dengê cendermeyek hate bihîstin û got “Mûxtar gazî we dike,
hemû vegerin.” Pasê
mûcîzeyek çê bû bû, birayê Mûxtar Sabrî Efendî ku min wî ji Sêrtê nas
dikir, tistên hatiyên
serê me bihîstibû û ji bo me rizgar bike, birayê xwe îkna kiribû û ji bo me
bexsandin

xwestibû. Heftiyek din jî, em li gûndê Bêkendê man. Bi rojan me li malan
qerwasiyê fikir û
sevan jî em li êxûran de radizan.
Ji Sêrtê re waliyekî nû bi navê Bayram Fahmî Beg hatibû bi rê kirin. Da ku
li mala wî
qerwasiyê bikim gazî min kiribûn. Min keça xwe emanetî Amînayê li
gûndê Sêx Asoyê
Têlanî kir. Rêhevalên min ên qedere jî, dixwestin bi min re werin Sêrtê û
li wir xwe xef bikin.
Lê gava Tirkan bihîstibû çend kesên mesîhî hatine, li wan geriyan û
hemûyan dan kûstin. Yek
ji wan xeniqandin û yên din jî dan ber xencera. Bi tenê ez li bin parastina
walî de sax ma bûm.
Li ser kûstina Metropolîtanê me serpîskopos Adday Sêr ez van tistan hîn
bûbûm.
Hikûmet gava dest bi taqîbata Adday Sêr kiribû, Metropolît bi alîkariya
Osman Axayê
Tanzêyî reviyabû. Osman Axa serokê esîrên Kurdên Atamîsa û Hedîdê bû.
Osman axa bi
riyekî nepenî da, cilên gûndiyan lê kiribû û biribû malekî ku ji alî esîrê
Osman axa ve dihat
parastinê. Metropolît çend rojekî li gûndê Tanzê, li cem Kurdên wê derê
mabû. Lê
cendermeyan li her derî wî digeriyan û dixwestin wî bikûjin. Di dawiyê de
zanîbûn li gûndê
Osman axa hatiye xef kirin. Wî ji Osman axa xwestibûn ku teslîmî wan
bike. Lê Osman axa

di serî de vê yekê qebûl nekiribû. Cendirmeyên êrîsî Osman axa jî kirin û di dawiyê de cihê Metropolît hîn bû bûn. Adday Sêr xwestibû bireve, lê bi heft hest gûlleyên bêbext ketibû wê erdê. Serleskerek tiliyê wî yê gustilkê, jê kiribû û gûstilka Metropolîtaniyê ji tiliya wî dexistibû. Sekreterê Adday Sêr, Cebrail Mûsa Gorgis (Adamo) hate girtin û bi awayekî hovane hate kûstin. Di destpêka komkûjiyê de, gelek keseyên gûndên Sêrtê, xwe li katedrala mezin de xef kiribûn. Di nav wan de Kese Corcisê Bêrkêyî, Kese Hannayê Sedexî, Kese Mûsa, Kese Tomas, Kese Yûsivê Ginyanisî û Kese Mîhaîlê Mar Yaqubî jî di nav de ev hemû kese hatibûn kûstin. Mal û milkên Dêr û xaniyên mesîhiyan hatibûn talan kirin. Serlesker ketibûn xaniyên herî sipehî û wên mayîn jî ji alî êrîskeran ve hatibûn hevpar kirin. Ez li bin xizmeta waliyê ku leskerên wî li Sêrtê, komkûjiyê pêk anîbûn de seh meh xebitîm. Tirkên ku hatibûn bajêr gelek kêf xwes bû bûn ku, Mesîhiyên li Sêrtê hemû hatibûn sirgûn kirin û kûstin. Ji xwe vê dil xwesiya xwe li her derî dianîn ziman. Kesên ku li taxa qesra walî de rûdinistin û di nav wan de, Mela Elyas, Mele Xidir, Mele Ehmed û Mele Tahîr jî di nav de, meleyên ku tevî vê komkûjiyê bû bûn, gava di bûn Mîhvanê walî, ji min re digotin

careke din tû Mesîhî êdî ne wêrin lingê xwe bavêjin Sêrtê. Kesên ku werin jî wê werin kûstin.

Ez çend caran li ber Katedrala me de derbas bûm. Di her carî de dilê min teng dibû û

dileriziyam. Mala Xwedê kiribûn wekî êxûrekî ku bîhnên pîs jê dihat. Goristana me bi temamî

hatibû talan û qirêj kirin. Hemû kevirên gora hatibûn sikênandin û gor pê zibilê hatibû qirêj

kirin.

Pistî vê çîroka Sosin Xanim, xemgînî û bêdengî ketibû nava hewsê. Ez di nav hinek

pirsan de diçûm û dihatim. Pistî van serpêhatiyên qirêj û balkês êdî Sêrt di hisêminde bû bû

bajarê kûstin û mirinê. Bi taybetî jî ku niha ez jî li wir rûdinim taxa Keldanan an jî taxa Ayn

Salîbê ku niha navê wê gûherandine, kirine taxa Înonû. Min qet tistekî weha ji vê taxa xwe

dernextibû û ne fikirî bûm. Ez li ser malên van kûstî û miriyan dijîm. Ji xwe ez jî li xaniyekî

Ces de hatibûm dinê. Dibe ku xweyê vî xaniyê pêsî kesekî Keldanî be. Mêrê Sosin Xanimê,

Xalê Behrî dest bi axaftinê kir. Lê berî ku bi axive, dergehê hewsê malê vebû û mîhvaneke

din jî kete hindirû. Pistî xwes pêswazî kirinê, em bi mîhvanan re hatin nas kirin. Navê wî

Dawid bû, ew bi xwe jî nêzîkî 65-70 salî tê hebû.

Xalê Behrî cihê xwe yê li ser text xwes kir û piçekî li pês ve vekisiya, serê xwe hilda û

dest bi axaftina xwe kir û got; ezê jî ji were serpêhatiya mirovekî Bohtî bibêjim.

- 5 -

Di wan demên xelayê de ez li medresa Tillo de sagirt bûm. Tillo navçeya Sêrtê ye û

nêzîkî niv seetî dûrê, rojhilatê bajêr de cîh digre. Tillo jî cihekî Keldanan bû, ji xwe ji navê wê

jî ev tist diyar dibe. Tillo bi zimanê wan tê wateya "Rihên Bilind". Tillo li ser pista çiyayên

gelekî bilind û berz de hatiye ava kirin. Ez bawerim ew bilindahiya li ser navê navçeyê, ji wê

bilindahiyê tê. Ji bajarê Sêrtê jî gelekî bilindtir e. Bi zanîn û zanîngehên xwe deng veda ye û

kesayetiyên bi nav û deng, di dergûsa xwe de afirandiye. Ji nav van kesayetiyên Hz Brahîm

Haqqî û mamosteyê wî Hz Îsmaîl Fakirullah gelekî bi nav û deng in. Heta li vir ji bilî ilmê

Erdnîgarî, Felsefe, Olî, Dîrokê, ilmê Stêrnasiyê jî dihat kirin. Ji bo vê yekê jî bavê min

xwestibû, min li vir dest bi xwendin û nivîsandinê bikira. Em ji xeynî rojên bi taybet, ji

medresê dervediketin. Lê ji hemû bûyerên heremê em pê agahdar di bûn. Em ji vê komkûjîyê

jî hesiya bûn. Ji ber ku li wir jî hinek komkûjîyên Asûrî Keldaniyan çêbû bûn.

Wê rojê li hewsa medresê da, li bin siha dara tûyê, min dersên xwe dûbare dîkir. Min

hew dît ku dengê dergehê medresê lê xist. Min çû derî vekir. Mirovekî ku
ji cilên wî diyar
dibu ku mirovekî Bohtiyê kete hindiru. Em bi hevra li medresê da li bin
siha dara tûyê
rûnistin. Mêrik bi bejneke kin, xwedî rû û simbêlên gelekî li hev hatî bû.
Lê di hûndirê wî da
gelekî tist di qewimîn û diyar bû ku ditirsiya. Ji berîka xwe qûtiya tîtûnê
derxist bi heskê pê
êxist. Mijekî kûr ji cixara xwe kisand û pûf kir, ji kûrahiya dilê xwe axinekî
wisa kisand ku
min tê derxistibû ku derdekî wî yê gelekî mezin hebû. Hisê wî de tije pirs
û pirsgerêk hebûn.
Pistî demekî em bi hevra axivîn, sedema hatina xwe ya li vê derê û
serpêhatiya xwe ji min re
qiset kir.
Ez mirovekî Bohtî me, ji gûndê Tîrîm tême vir û elhemdûlillah misilmanim
rews û
halê min
jî gelekî xwese. Lê heya beriya heftiyekî wisa xwes bû, niha ez ketime
derdekî bê derman de
ku ne serî heye û ne jî binî. Xezeba mirinê mohra xwe li eniya min xistiye.
Bi xeletiyekî ku
min jî nezanî çawa qewimî, çêbû û pêkhatî de ez diçim û têm. Ev bûyer ji
xwe bûye kabûseke
mezin ne xew ji min re histiye û ne jî hizûr û aramî. Bûye sî û ketiye pey
min, ji xwe ez gelekî
posmanim lê posmaniya dawîn jî feyde nake. Wê rojê li mêja Îniyê de,
melayê gûndê me mela

Mûsa li ser kesên dijî misilmanan weez kir û mirovên ne misilman wê rojê li ber çavên min de res kiribûn û bi gotina wî yekî misilman ku ji mirovekî bi xwaze û ne be misilman û sehadetê neyne kûstina wî kesî helal e û ji wî yê ku kûstî re jî dergehên bihûstê heta ji mêj ve wê vekirîbe. Pistî xûlbê ez çûm mala xwe û tevî zarokên xwe me lîstik leyîstin û pasê razam. Di xewna xwede min qabûsekî ecêb dîtibû, ez ketibûm nav tariyekî wisa de ku ji resê restir û ji tariyê tarîtir bû, min nedizanî wê çi bibe û biqewime, ez gelekî tirsîyayî ji wê xewa nepenî siyar bûm. Lê min dizanî ku, her zayîn avisê mirinê, her mirin avisê jiyaneke nûye. Her bêdengî di singa xwe de qêrînek hildigirt û di her tariyê de ronahiyek vesartîye û min dizanî ku heta roj dernekeve, ixaneta tariyê nedihat zanîn. Ji bo vê yekê min vê xewnê di herikîna wext û demê re histibû. Roja din ji bo hinek karê xwe, hê xweza di xewa xwe ya nepenî de, ku pelên dara ne dihejiyan, ez ketibûm li ser riya bajarê Sêrtê. Ez hatibûm li ber ava Bohtan li ber avê min xwarina xwe bi kelekvan Sofî Evdêyê Tahir re xwar û tevî hespê xwe li kelekê siwar bûm û hatim vî milê avê. Ez gihatibûm li wê ervaziya Serê Zînî. Ji dûr ve sê kesên jin jî ji Sêrtê dihatin û dixwestin li kelekê siwar bibin û li ser ava Bohtan, xwe bigihînin Dîcle û ji wir

jî herin Nînovayê an jî Mûsilê. Ew her sê jin gelekî birçî û ji taqetê ketibûn,
hesreta bêhna
pariyêke nanê germ, an jî fireke ava cemedê Ayn Salîbê bûn. Ji nêzîk ve
min zanî ku ji ola
Mesîh in. Ez di riya xwede diçûm, ewan gazî min kirin û ji min tika kirin ku
ez pariyekî nan
an jî tistekî xwarinê bidim wan. Lê min neda wan û min ji wan xwest ku
ew werin li ser dînê
min. Ji bo vê yekê min ji wan re got ger hûn bibin misilman û peyva
sehadetê bînin ezê nan jî
bidim we û av jî, lê wan jî got me nanê te jî navê û ava te jî navê. Pistî vê
bersîvê ez gelekî bi
hêrs bûm, ji bo ku xwesteka min nehatibû cîh ewan gotibû me ne ava te
û me ne nanê te divê,
ez jî gelekî bi hêrs bûm û min dest avêt xencera xwe ya Misrî û dîsa min
gotina xwe dûbare
kir û lê zêde kir ku ew nebûna misilman min sond xwaribû ku ez wan her
sê jinan jî bikûjim.
Ew dîsa li dijî xwesteka min derketibûn û ez bi hêrstir jî bûbûm û min bi
xencera xwe, tevî
hespê xwe yê kihêl êrîsî wan kir. Ew der bûbû wekî gola xwînê, xwîn bi
axê re zewicî bû.
Xencera Misrî a bi xwîn, hêrsa min êxistibû. Lê ez êdî ketibûm nav derdekî
bê derman û
lêgerînek nû û jiyaneke nû de. Pistî van kûstiyên êdî min zanî ku ew jîna
nû ya avisê êdî za bû.
Êdî ew jiyana bi tijî kabûs û nepenî li benda min bû. Ewan ji bo jiyaneke
birûmet û serbilind,

li berxwe dabûn û kûstinê ji bo xwe û baweriyên xwe bastir dîtibûn. Ez
gelekî posman bûm,
hemû bedena min dilerizî. Ez ketibûm taya tirsê û posmaniyê. Ew jin bûn,
bê çek bûn, birçî û
tîhn bûn, dilêmin gelekî li wan sewitî bû. Ez bi demekî dirêj giriyam,
rondikên çavên min
zûwa bû bûn. Lê min zanî ku bîhna min biçikiya jî ew êdî rastiyeke bû,
rastiyeke mîna mirina
sar, mîna jînê, rastiyeke mîna mirovan. Ez êdî di nav rastiyan de bûm yek
dil û yek beden. Her
çiqas rastî tûj û bi jan be jî, zor û zehmet be jî, di dawiyê de min vê yekê
pejirand. Lê dibe ku
li sîna min, kesekî din nekaribe xwe li ber vê rastiyeke bigre. Pasê min biryar
da ku ez wan
bisûm û têxim gorê. Min ji ava Bohtan av kisand û ew sîstin. Cihên derbê
xencerê gelekî kûr
çûbû, ji wê germahiyê xwîna wan zûwa bûbû, lê ax bi xwîna wan sê jinên
gûneh bû bû herî. Ji
ber germê axa ku ji xwînê sor bû bû û ku êdî ax jî derizîbû. Pistî min wan
sîst û êdî min dest
bi kolana gora wan kir. Min sê gor li berhev kolan û pasê li ser wan hinek
hedîs û ayetên pîroz
xwendin. Ez êdî wek dînan lê hatibûm. Ji xwe ji giriya rondikên çavên min
ên zûwa êdî ne
diherikîn. Wê sevê ez li wir seveder bûm û li wir min dixwest razê lê
xew nêzîkî min jî
nedibû. Êdî tirsê mirinê di sevan de derket pêsberî min. Sev, seveke pir
bêdeng, sevê

bedengiyê himbêz kiribû. Ês û janên min ji bêdengiyê re hevparî dikirin,
xweza û stêrk jî
bûbûn hevparê bêdengiyê. Ava Bohtan kû her tim wekî dînan diherikî ew
jî bêdeng bû. Dibe
ku tev ji min xeyidî bûn, sahidê vê bûyerê bûn. lê ji bo xatirê van miriyên
bê gûneh diviya
dîsa biherikiya. Çiya ji xwe destpêka newalan ve ji hev xeyidî bûn û
bêdeng bûn. lê bi sebrekî
mezin li min temase dikirin. Erd û asîman tev de bê deng bûn. li wê sevê
êş, qehr û kerba bi
hezar salan min kisand. Ez bû bûm miriyek zindî. Êdî sev qediya bû, çav li
belavkirina
bêdengiya xwezayê digeriyan. Min dixwest carek din ev bêdengiya
mirinê, di sevên res û tari
yên dem dirêj de ne be. Êdî sev daketibû, rojê nû, jiyaneke nû destpê
kiribû. Ez li hespê
xwe siwar bûm û çûme Sêrtê. Vê bûyera res min ji mele Mihemed pirsî,
ji min re got;
Qetlê wan kesan ketiye stûyê te, te mafê wan xwariye û te gûnehê herî
mezin kiriye. Ev
gûnehê te xwedê jî efû nake, ji ber ku ev mafê mirovan e û encex ew
mirov dikarin te efû
bikin, ne xwe tû çarekî din tûne ye. Mafê mirovan cûdaye, mafê xweda
cûdaye.” Pistî vê yekê
tirs û birîna min a bêderman mezintir bûbû. Dîsa ez ketibûm li ser rêya
gûnd. Di cihê wê
bûyerê de ez dîsa demekî dirêj sekinim. Ew bûyer dîsa ji serî heya dawî
hatibû li ber çavên

min. Min li ser gora wan dîsa dia yên herî pîrozê ku min dizanibû xwend.
Dîsa giriya min dest
pê kir, min ji xweda û wan sê jinan efû xwest. Piçekî dilêmin rehet bû bû.
Ez vegeriyam gûnd,
ji xwe ji melayê gûnd ez gelekî bi hêrs bû bûm. Lê bê çare min vê bûyerê,
bi hêrs bûyî, ji
melayê gûnd re jî qiset kir. Melayê gûnd got, te qenc kiriye, dergehê
bihûstê ji bo te vekiriye.
Te xêrekî gelekî bas kiriye. Lê min got melayê Sêrtê wiha na bêje, dibê te
mafê mirovan
xwariye, xwedê jî mafê wî tûne te efû bikê, encex ew her sê jin te efû
bikin. Melayê gûnd got
ew mele bas ne xwendiyê, derheqê vê bûyerê de tistekî nizane, tû gûhê
xwe nede wî. Lê her
çiqas ewî wisa gotibe jî dilê min qet rehet ne bû bû. Heftiyek derbas bû,
her sev û di her
bêdengiyê de mîna qabûsekî ew her sê jinên bê gûneh, diketin ber çavên
min. Min vê
serpêhatiya xwe ji gelek kesan re qiset kir, mixabin derheqê vê yekê de
kesekî tistekî rast
negot. Her kes li gor xwe sirove fikir. Hinek kes jî gotin here Tillo li cem
Mela û Seyda yên
wê derê li gor serîetê wê tistekî rast helbet ji tere werê gotin. Aha hatina
min a vêderê ji bo vê
yekê ye. Ji ber vê ye ku ez ji dil nakenim, her çiqas tû min dibînî jî lê kezeba
min xwîn
digirî, ez niha zindî tê me xuyan mixabin êdî ez bûme mirovekî miriyek
zindî.

Birastî ez gelekî lê sewitîm û ez niha bûbûm hevparê hemû hestên wî û
bûbûm hevparê jan û
êsen wî. Min jî jêre got, bira birastî jî tistê te kirî tû ol vê yekê napejirîne.
Hemû ol ji bo aramî
û xwesiya mirovan hatine li ser rûyê dinê. Tû ol, tû pirtûkên pîroz nabêje
here mirovekî
bikûje. Hebû dibêjin alîkariya mirovan bike, tistê herî bas û qenc eve. Ger
bi kûstinê bûya ji
xwe ne ez hebûm û ne jî tû. Em mirov encex bi alîkariya hevdû, em dikarin
hizûr, aramî û
xwesiye di navbera mirovan de çê bikin. Em bi kûstin û talanê nagihijîn tû
deverê. Hemû
mirov wekî hevin, çî mesîhî, çî misilman, çî êzîdî an jî cihû, em tev ji dê û
bavek çê bûne, em
tev birayê hevin, mirovê hevin ji bo vê yekê jî kûstin gerek ne karê
mirovan be. Lê ev tistê ez
ji te re di bêjim dîtina min e. Derheqê vê bûyerê pirtûkên pîroz çî bêjin,
serîet çî dibêje ez
nizanim. Lê qasek din Mele Qedrî gava hat tû bi xwe jê bipirsî bastire.
Pistî wê gavê min êdî wî mirovê Bohtî nedît. Heya deh salên din rojekî em
rastî hev hatin.
Ewî Heft sal li ser hev rojî girtibû û gelek pirtûk xwendibûn bûbû mirovekî
zana, ji xwe êdî
her kes jê ra digot Hacî Xelîfe. Hacî Xelîfe min nas kir û derheqê wê bûyera
xwe got te rast
gotibû, min li ser wê bûyerê gelek lêkolîn kir û gelek pirtûkên pîroz min
xwendin. Hemû
pirtûk wekî wê gotina te dibêjin.

Çiroka Xalê Behrî jî xelas bûbû. Dem, ber bi nîvê sevê ve diherikî, em di nav wan bûyerên qirêj de, diçûn û dihatin. Di her çîrokê de serpêhatiyek û her çîrokê de bûyerek û her çîrokê de paseroj hebû. Dawid jî xwestibû tistekî bibêje, helbet ewî jî hin tist bihîstibûn derheqa wan bûyeran de. Çaya ku li ber bû vexwar û xwe amadeya çiroka xwe kir.

– 6 –

Pistî çiroka Xalê Behrî, Dawid jî xwest tistekî li ser van bûyeran bibêje. Dawid di demekî dirêj li Stenbolê hemalî kiribû û nêzî sîh çil sal li bajarê Stenbolê bi cîh bû bû. Lê ev çend salin vegeriya ye welatê xwe û dixwaze dawiya jiyana xwe li ser axa bav û kalên xwe bi dawî bike. Dawid dixwaze serpêhatiya keçeke bibêje û dest bi gotina xwe dike û dibêje; Hinek Misilmanên Sêrtê keçên ciwanên Keldanan ji bo kar û barê xwe wek kole wan dixebitandin. Lê hinek malbat pistî dawiya 1918 an de hatibûn li Stenbolê bi cîh bû bûn. Ev keç sala 1915 an de ji alî hinek kesan ve ji malbata wan hatibûn revandin. Xwediyê keçikan ji ber birçî bûna xelaya wê demê dixwestin van keçikan bifrosin. Hinek kes ji bo birçîtî, hinek kes jî vê ji xwere kiribûn bazirganî. Kerîma 13 salî bi vî awayî gihîstiya mirovên xwe yê Stenbolê.

Min dîsa wekî her roj werîsê xwe kiribû destê xwe û min hemaliya xwe
dikir. Ji ber ku gelek
kesên Kurd, li Kadikoyê rûdinistin û gelekî dewlemend jî bûn, min vê derê
karê xwe dikir. Ji
bilî Kurdan kesên ku ji Kurdistanê bihata, li Kadikoyê mihaqqak ziyaret
dikir. Ji xwe
dewlemend bûya li vê derê bi cîh di bûn.
Wê rojê ez li qehwa Cemsîd rûnistî, min nargila xwe dikisand. Ji xwe ev
der meskenê min bû,
kesên ku hemal ji wan re pêwist bikira dihatin kahvê û gazî min dikirin.
Hemû kesên li wir
rûdinistin min nas dikirin. Pistî demekî yekî hat û gazî min kir. Min barê
wî hilgirt û ketim li
ser rêya mala wî. Mêrik derî xist keçeke hat ser dergehê malê û dergehê
vekir. Min wî barê li
ser milên min êxist hindirû. Ji niska ve dengê wê keçika ciwan hate min.
Ev deng ne biyanî bû
ji bo min, mi vî dengî nas dikir, erê erê ev deng, ev axaftin, ev devok ya
welatê min bû. Min
gelekî bi dil xwesî ji wê keçika ciwan pirsî tû ne ji Kurdistanê hatî got belê.
Pasê got ez Sêrtî
me ez jî gelekî dil germ bûyî min jî got ez jî ji Sêrtê me. Gotin gotinê vekir
û xwediya malê
got rûne qehwekî vexwe. Pistî vê yekê gotûbêjên dirêj destpê kirin û
keçika ciwan ji min re
serpêhatiya xwe qiset kir û got;
Gava komkûjî destpê kir, ez hê deh salî bûm. Bavê min li Sêrtê Mûfettîsiya
Gûmrûkê da

dixebitî. Malbata min dayika min Hanna, bavê min Cercîs û sê birayên
min Kerîm, Yûsiv,
Latîf û ji bapîrê min ê kal pêk dihat. Li bihara 1915 an de xaniyê me yê li
taxa Ayn Salîbê ji
alî bîst leskeran ve hate êrîskirin. Di vê êrîsê de bavê min û bapîrê min bi
derbên xencerê
hatin kûstin. Dayika min, ez û birayên min me rêkirin li gûndekî biyanî.
Pistî jiyîna wê
komkûjiya li bajar ku hemû mirovên me hatibûn kûstin avêtibûn newalekî
de. Cendermeyan
min û keçên keldanên din birin gûndê Zevîda. Nêzîkî salekî em li gûndê
Zevîda mabûn. Bi
sev cenderme dihatin tecawûzê min dikirin. Ji ber tehdîdên kûstinê, çî ji
min dikirin min
nedikarî ez tistek bikim. Ji bo vê yekê li ber van bûyeran de min jî li ber
xwe dida.
Pistî salekî bi jineke misilman re ez vegeriyam Sêrtê. Ev jin xwest min bibe
mala me û
alîkariyek ji min re peyda bike. Ez bi wê jinê re çûm xaniyê me yê kevin
ku Evdilferîd li wir
bi cîh bûbû. Jinik wisa bawer dikir ku wê gûnehê Evdilferîd li min were û
alîkariyê bide min.
Lê mêrik li dijî vê me ji xanî avêt. Jinekî Keldanî ku li cem yekî Tirk
qerwasiyê dikir hate
alîkariya me. Jinik min bir cem xwe û min ê ji malê re avê bikisanda û
alîkariya wê bikira.
Rojekî ez çûbûm li ser kahniya Ayn Salîbê, da min cerên xwe yên avê tijî
bikira û vegeriyam

malê. Leskerekî hate cem min, navê wî Evdila bû, lesker li nexwesxana Sêrtê de dixebitî,
paqijiya nexwesxanê dikir. Bi zorê min bire mala xwe. Dayika wî Fatim xanim, min bire cihê
ku Keldanên bê gûnehên hatiyên kûstin. Li wê derê ji min re got” eger tû gûhê xwe nedî min,
tu jî wekî van bawermendên xwe tê werî kûstin.” Ev der cihekî gelekî bi tirs bû. Li her derî
hestiyên mirovan, hestiyên serê wan û pora wan jî dixûyan. Fatim di vegeerê de ji min re got
“hey bê bawermendê biçûk, tistên ku min ji te re got te fahm kir ne wisa”. Lê min newêriya ez
bersivê bidim. Ez di nav tirseke gelekî mezin de bûm.
Evdila tecawûzê min kir û tistên gelekî xirab jî li min kir. Nêzîkî sê salan bi van xerabiyên re
min idare kir û pîrheboka kal re min xizmetê û gotinên wê bi cîh di anî. Lê pasê li gûnda Xela
dest pê kiribû. Ji bilî qesabê mirovan Evdilrizaq hemû kes birçîtiyê dikisand. Di xaniyê
Evdilrizaq tijî xwarinên ku ji malên mesîhiyan dizî û talan kirî hebû. Evdila êdî nedikarî
malbata xwe têr bike. Ji dayika xwere digot zarokan bibe here parsekiyê bike. Lê dayika wî
biryar dabû ku ew tevî malbata xwe here Stenbolê. Di rê de wê û zarokên wê, xerabiyên wisa
mezin li min kirin ku ez nikarim ji te re bi bêjim. Ev rêwîti sê meh dom kir. Fatima kal li

Stenbolê min firot jineke misilman. Li Sêrtê lome li me dikirin, em kê
dihatin dîtin. Her
derême hatibû perçekirin, misqalên me jî dihat perçekirin. Ev jin bi
awayekî tesadûfî mirovekî
min nas dikir. Ji bo ku min bibe li cem wî, min gelekî jê hêvî û tika kir. Niha
ez li virim. Navê
mirovên min yê Stenbolê Zekî Hirîzê ye û li vir pêlavvaniyê dike.
Mirovên minên ku di komkûjîyê da hatibûn kûstin dayika min Hanna,
birayên min pêsî Latîf
)ji alî Evdilferîdê ku niha li mala me ya kevin de rûdinê de hate kûstin)
birayê min ê dûyemîn
Yûsiv û sêyemîn jî Kerîm, mamê min Pitiyan, dapîra min Rahel, bapîrê min
Sûzanne, xaleta
min Xatûn, meta min Helena, xalên min Tewfîq û Bûlos bi awayekî
hovane hatibûn kûstin.
Hemû mal û milkên me Xanî, mobilya, xalîçe, Zêr û zînetên me ku niha
xaniyê me yê Sêrtê
da rûdinê, ji alî Evdilferîd ve hate dizîn.
Girî ji ser rûyê keçika ciwan kê nêdibû, lê dîsa jî bi awayekî dil sewat vê
serpêhatiya xwe ji
min re qiset kiribû. Ji xwe ez gelek posman bûbûm ku min gotibû ez jî
Sêrtî me, lê ez çibikim
xwedê bela xwe bide wan mirovên hov û dirinde. Birastî ew roj ez gelekî
xemgîn bûm, ji xwe
wê rojê êdî ez nexebitîm, ez bi xemgînî çûbûm mala xwe û razabûm.
Dawid jî çîroka xwe qedan dibû, birastî wê sevê pistî van çîroka,
bêdengiya mirinê ketibû li

ser erd û asîman. Ne xaleta Berfê û ne jî kesekî din tistek negot. Bi tenê serê me li ber me, em xemgîn bûbûn. Wext bûbû nivê sevê, min û Remezan me xatir ji xelata Berfê xwest û wan û mîhvanên din jî xwest û bi xemgînê em jî vegeriyan mala xwe. Wê sevê xew neket çavê min heya sibehê ez li nav van bûyerên qirêj û gemar de diçûm û dihatim.

-7-

Xalê Saleh, kemeçebêjê herêma Bohtan e. Ew bi temenê xwe yê kal ve bûye sahidê gelek serpêhatî, evîn û mêrxasiya gelê heremê. Niha ew jî tevî hûnera xwe alîkarî dide rojnama Sêrta Azad. Wê rojê dîsa wekî her car hatibû nivîsgeha rojnamê. Min wan ses çîrokên komkûjiyê li ser rûpelên sipî nemir dikir. Xalê Saleh dixwest ez wan ses çîrokên komkûjiyê jê ra bixwînim. Bi sebirek mezin li min gûhdar kir û wekî her kesî ew jî bi van çîrokan xemgîn bûbû. Ji xwe min dizanî bû ku li ser van mijaran de ew gelekî têgihistî û ji wan bûyerên qirêj jî agahdar bû. Ji xwe hemû dengbêj sahidê dema xwe û berdewama berî xwe bûn. Diviya serpêhatiyên gelê xwe, mêrxasî û xaîntiya di navbera mirovan de, serên navxweyî, evînên têkçûyî û bûyerên girîng ên di dîroka gel de, bi awayekî hûnerî pêskêşî gûhdaran û van bûyer, serpêhatî û çîrokan emanetî nifsên nû bikiran. Dengbêj bi peyv û gotinên van bûyeran bi

awayekî xwes û li hevhatî dikirin stran, kilam an jî çîrok û radixistin ber gûhdaran. Gûhdarên dengbêjan jî bi van serpêhatî, dîrok, destan û çîrokan agahdar dikirin. Xalê Saleh hemû gûnd û bajarên herêma Bohtan geriyaye û tevî sahî û sêniyên mirovên Bohtî bûye. Ger çiqas ew niha kal bûbe jî dikare mîna nexsekêsekî, gav bi gav herêma Bohtan bi gotinên xwe yê balkêş û kevnare, hemû gûnd, bajar û avahiyan ra têxe li ber çavan. Ji ber vê gera xwe jî bûbû, sahidê gelek bûyer û serpêhatîyan. Xalê Saleh bu bu sahidê bûyera Serhildana Mala Eliyê Yûnis ê Sasonî, serhildana Mala Yaqûb Axayê Dihî (Erûhî,(serpêhatiyên Bisarê Çeto, serên li heremê qewîmî û komkûjîyên mesihîyan. Lê gelek bûyer û serpêhatî jî ji bîr va kiribû. Lê pistî xwendina wan çîrokên komkûjîyê, derûnî, giyan û hisê Xalê Saleh ser û bino bûbû. Wê gavê serpêhatiya hevlekî wî yê herî bas hatibû bîra wî. Ev hevalê wî kelekvanekî li ser çemê Bohtan bû, navê wî Sofî Evdê Tahirê Xêrtî bû. Sofî Evdê li ser çemê xûrt û bi heybet de kelekvanî dikir. Sofî mirovekî dewlemend, dest vekirî û li wê herêmê xwedî rûmet bû. Xalê Saleh bi nêrîneke kûr û dûr û bi xemgînî difikire. Wisa xûya dike ku ji wê serpêhatiyê diêse. Pistî sekna demekî kin, dest bi axavtina xwe dike û serpêhatiya Sofî Evdê yê Kelekvan dibêje;

Sofî Evdê hevalê min ê herî bas bû. Kengê dawet an jî sahiyek li gûndên
Bohtan çêbuya, bi
dîtina hevalê xwe, ez bi dilxwesiyeke mezin bi rê diketim. Ji xwe ev dibû
sebepe ku dîtîna min û
Sofî pêk dihat û ez çend rojekî dibûm mîhvanê wî. Sofî Evdê Kelekvan li
vê herêma Bohtan
de ji alî hemû mirovan ve dihat naskirin û ji bav û kalên wî ve jî ew dihate
nas kirin. Bav û
kalên wî hemû kelekvan bûn. di wan deman de kelekvanî karê herî bas û
pêsketî bû. Sofî ji
bilî kelekvanîyê, xwendin û nivîsandinê ve jî jêhatî û kêrhatî bû. Ji bilî
Kurdî çar zimanên din
jî dizanibû û nêzîkî deh salan li medresa Tillo de xwendibû. Ger çiqas ewî
îcaza meletiyê
sitandibû jî digot ez hê tê negihistime û ne bûme melle, divê ji bo
meletiyê ez piçekî din jî
bixwînim. Ewî xwe wekî Sofî bi nav dikir û ne dixwest kesek jêra bibêje
mele. Ewî dixwest
heya dawiya temenê xwe bi xwendin û zanînê derbas bike. Xaniyê Sofî jî
li ber ava Bohtan, di
nav bax û bexçan de hatibû ava kirin. Sanesîna xaniyê wî li çemê Bohtan
dirênî û bi sevan û
berbangan dengê avê dilê mirov paqij dikir û ji bo jiyaneke nû, tevî zeraqa
tavê beyanê hestên
nû û xwes diket dilê mirov. Gava ez dibûm mîhvanê Sofî, li sanesîna xanî
em rûdinistin. Ewî
ji min dixwest ez kemeçê lê bixim û strana “Kirîva Hana” ku gelekî jê
hez dikir dixwest ku

ez bibêjim. Carna sê çar cara bi tenê vê stranê bi dengê têlê kemaçê a zirav min jêra lê dixist.

Sermest dibû, her dem digot “siheta te xwes û dengê te li dinê be Saleh”.

Carna me bi hevra

Saraba Sor vedixwar û min jêra stranên meqama payîzokî digotin, ewî jî li stranan de bi min

re hevkarîyê dikir û dengê me tevî dengê ava Bohtan dibû. Carna çem jî gûhdarî me dikir û

qet deng der ne dixist, bê dengiya çem me jî xemgîn dikir û di wê bê dengiyê de, hestên me

germ di bûn û em di giriyan. Sofî ji serabê gelek hez dikir û digot pistî tufana Nuh av kisiya

pasê xweza ji nû ve afirî û tiriyên vê derê ji nuve çêbûn. Nebî Nuh bi tiriyên behra xwe Dims,

bastîq, pestil, helil û serbet çêkir. Seytên bi tiriyên behra xwe sirke û sarabê çêkir û got; her kî

ji van sarabên min hinek vexwe bila wekî sêran bi hêz be. Ew kesê ku du qetê wî vexwe bila

wekî bizinê xwedî rik be. Kesê zêde vexwe bila wekî meymunê xwedî istah û yê ji wê jî

zêdetir vexwe bila wekî baraz xwedî kîn û nefret be. Aha ji wê rojê ve ev nifûn li serabê hate

kirin ji ehlê wê re helal û ne ehlê wêre jî heram e. Ji ber vê yekê jî her çiqas Sofî hez ji sarabê

dikir jî lê qet zêde venedixwar û tama xwe de dihist.

Carna sofî ji min re helbestên evînî dixwend û ez xemgîn dibûm. Li odekî xaniyê sofî de

pirtûkên cûr bi cûr hebûn. Ji bilî helbestan min hez ji pirtûkên kevnare ê dîrokî jî fikir. Bi taybetî pirtûka bi navê “Anabasîs Vegera Deh hezaran” fikir. Ji bo ku pirtûk behsa jiyana berî zayînê yên li ser van axan fikir. Ev pirtûk ji alî nûçegihanekî ser, berî zayînê salên çar sed û yek û didûyan de ji alî nivîskarekî Yewnanî Ksenefon ve hatibû nivîsandin. Di vê pirtûka kevnare de qala herêm û çemê Bohtanê jî dihat kirin. Di wan deman de navê Bohtan Kentrîtes e. Nivîskarê Anabasîs Ksenefon bi xwe leskerekî Yewnanî bû û tevî serê nav xweyî yê Yewnaniyan bûbû. Di encamê de ew dibê serokê artêşê û ew û deh hezar hevalên wî, bi mehan di nav xaka —————mparatoriya MedoPars de bi ser û pevçûn mesiyabûn. Ev artêş li ber ava Bohtan jî mesiyaye û çûne heya Derya res û di encama rê vebiriyeke dirêj de vegeyane welatê xwe. Li gorî pirtûkê wê demê milekî çem de Med an jî Kardûxî yanî bav û kalên Kurda dijiyan û milê din ê çem de jî gelê Ermenî dijî. Ermenî û Kardûxî êrîsî Yewnaniyan dikin û gelek Yewnanî jî di encama ser de têne kûstin. Yewnanî di nav çiyayên asê yên Bohtan de neçar mane û sev jî li vir razane. Lê sevek serleskerê Yewnaniyan Ksenefon xewnekî dibîne, di xewna xwe de, lingê Ksenefon hatiye girêdan. Lê pasê ew girê vedibe û Ksenefon bi

awayekî azad dimese û gavên mezin davê. Li ser vê xewnê Ksenefon
 gelekî kêfxwes dibe û ji
 wê xewnê moral distîne. Sibehî zû tevî leskerên xwe bi awayekî mûcîze
 derbasî milê Ermenan
 dibin û ji wir jî ber bi jor ve dimesin diçin. Ji bilî van tistan, behsa bilindahî
 û heybeta teht û
 zinarên asê yên Bohtanê û jêhatî bûna Kardûxan jî tê kirin. Ji xwe pistî
 demekî din ev pirtûk
 dibe rêberekî —————skenderê Makedonî.
 —————skender bi riya vê pirtûkê taktîk û taybetmendiyên
 Madopersî yan, welat û cîranên wan, psikolojiya wan nas kiriye û helbet
 alî wan yê xûrt û qels
 jî zaniye û pasê jî dawî li —————mparatoriya MedoPers
 aniyê. Ji bo vê yekê jî ev pirtûk gelekî bala
 min dikisand û min jî ji Sofî dixwest ku wî pirtûkî heya dawiyê ji min re
 bixwîne. Ev rûpelên
 dirokî piroziya van axan nisan dida û ji bo vê yekê jî hezkiriyek cûda û
 qedîm dixist dilê min.
 Gelek sevan ez û sofî di ber avê heya sibehê, bi sohbetên germ û zayînî
 me derbas dikirin. Lê
 mixabin bûyerek wisa li ser sofî de qewimî ku ji kerba dilê xwe koçî
 dawiyê kir. Ew bûyer jî
 di wan demên komkûjîyê Sêrtê de qewimî bû. jin û zarokên keldanan ji
 Sêrtê reviyabûn û xwe
 sipartibûn Sofî Evdê. Sofî wan sikeftekî li ber ava Bohtan de xef kiribû.
 Wisa biryar da bûn
 ku heya roja din wê bi sev bi rêketan û li ser ava Bohtan a dîn û har de, li
 ser kelekê biçûna

heya Musilê. Lê bûyerek hovane li ser wan kesan qewimî bû û sofî vê
meselê berî ku here
koça dawîn ji min re qiset kiribû.
Kele germa havînê bû, wan rojan hinek bûyer diqewimîn. Gelek kes behsa
komkûjî û serê
dikir lê rastiya van qisetan kesekî nedizanî. Wê rojê jina hevalekî min ê
Keldanî û çend kesên
din jî pêre hatibûn. Ev ji xanima Yakûbê Keldanî bû. Yakûb li Sêrtê
bazirganî û etariyê dikir.
Ji ber ku gelek car dihat derbasî milê dinê avê dibû, ji bo vê yekê jî
têkîliyê germ navbera
min û wî de çê bû bû. Bi xanima Yaqûb Sarêxan re jin û zarok nêzîkî bîst
kes hebûn. Yakûb
di komkûjiyê da hatibû kûstin. Berî ku bimre ji sarûxan re gotibû herin
cem sofî wê alikariya
we bike. Ji bo vê yekê jî Sarêxan, zarokên xwe û hinek mirovên wî hatibûn
cem min û
dixwestin ez wan bibim Musilê. Ji xwe ji Sêrtê bi piya hatibûn û tû taqeta
wan nemabû. Gelek
perisan bûbûn. Ji ber xêr ne xwazan min ne dikarî ez wan, li mala xwe de
biparêzim. Ji bo vê
yekê min wan bir sikefta tarî û xwarin, vexwarin û find û qendîl jî min ji
wan re biribû. Ji bo
parastina wan min ji wan xwest ku ji navê sikeftê dernekevin der. Sibê
sev emê tev de rê
biketan. Cihê wê sikefta tarî ji bilî min kesekî nedizanî. Pistî demekî çend
lesker û zabit li pey

wan hatibûn. Pirs a wan kesan kirin û gotin saredarê Sêrtê Hamî Efendî gazî te kiriye.

Ji lesker û zabitan re min got kesekî alî min ve nehatiye. Ji xwe iro misteriyê pêşî hûnin,

kesek ne ji gûnd hatiye û ne jî ji Sêrtê hatiye vir. Min got base ezê sibê zû werim cem Hamî

Efendî. Gelo ma hûn nizanin ji bo çî gazî min kiriye. Lesker û zabitan qet deng nekirin û li

keraxên çem ketin rê û gera wan kesan, roja din li hespê xwe siwar bûm û ketim ser riya

Sêrtê. Ez li Serêzînî ya bilind hewa ketibûm. Sêrt bi hemû dîmenên xwe yê bi taybet ve li bin

piya xuya dikir. Toz û dûman li ser bajar ketibû. Gelek xanî û avahî sewitî û hilwesiya bûn.

bihneke ecêb ji bajar dihat. Nêzîkî taxa Keldanan û qesra Hamî Efendî bûbûm. Ji xwesî û

bedewiya taxa Keldanan tû avahî û bermahî nemabûn. Katedrala Mezin, pirtûkxaneya nav û

deng û hemû bermahiyên Mesihyan hatibûn sewitandin. Ez çûm qesra Saredar Hamî Efendî û

ketim hundir. Pistî bi xêrhatiniyê Hamî Efendî, ji min re wiha got; hinek filleh ji ber destê me

reviyane, em dizanin ne mumkune ku bêyî kelekê derbasî milê avê bibin. Baweriya me bi te

tê, em dizanin ku tû wan kesan bibînî tê teslîmî me bikî. Tû dizanî ku hûrmeta me ji bo te

gelek heye, tû jî layiqî vê hûrmetê bibe û ger tû wan kesan bibînî xeberek ji mere biseyne. Me

Sêrt ji Fillehan paqij kiriye, divê tû jî tevî vê paqij kirinê bibî û alîkariyê bidî me. Hamî
Efendî dîn bûbû nedizanî çî dibêje. Bihna xwîn û mirinê jê dihat. Ew di ber çavên min de êdî
ne mirov bû. Xwînmijek Hov û dirinde bû. Ji axaftina wî min serm dikir û kerba dilê min, bi
hêrstir dibû. Ev avahî û xwesiyê ku ji keda mirovan hatibû avakirin, iro dîsa bi destê mirovan
ve dihat xera kirin. Gelo çima ev kûstin? Ji bo çî mirov vê dinê ji xwere dikin dogeh? Ez di
nav van pirsan de diçûm û dihatim. Ez ji qesra wî xwînmijî derketim û bajarê birîndar
geriyam. Kerba dilê min dikeliya, ew xanî û avahiyên ku hatibûn xera kirin de, jiyanên cûda
cûda jî hatibûn kûstin. Mirina sar mohra xwe li enî û dilê bajar xistibû. Her tist gûherîbû ew
avahî û bajêr lanet li mirovan dibarandin. Erê mirov sîrê xîç xwariye. Bajar dîsa ji regekî
lawikên xwe, ber bi mirin û kûstinê ve bi rê kiribû. Êdî bajar dergehên xwe ji basî û xwesî yê
ra girtibû. Rûmet û dilovaniya xwe wenda kiribû. Erê dîsa dirok dûbare bûbû wekî her demî
dîsa mirov ji alî mirovan ve hatibû kûstin. Dêr, xanî û avahiyên van bawermendan tev hatibûn
sewitandin. Ji bilî leskera kesek li kûçe û kolanan de tûnebûn. Zarokên kûçeyan wenda bûbûn
dengê lîstik û qêrînên wan, li bin diwarên sewitandî de xef bûbûn. Pistî wan dîmenên qirêj û

gemar min jî terka vî bajarê birîndar kir. Bi xemgînî û dijiwariyê min berê
xwe da mal. Xweza
tevî vê komkûjîyê bêdeng mabû. Xwesî û bedewiya xwe gûherandibû êdî
serm fikir. Giya û
kûlîlkên xwe ranedixist ber çavan, hevî û evînê êdî nedixist dilê mirovan.
Kûstin, talan û
wêran kirin hemû lasê min û hestên min dîl girtibû. Bi tenê girî dihat ji
destê min. Di nav van
hestên kovanî û jarî de ez gihabûm mala xwe. Êdî min meraqa wan
emanetî xwe fikir bi vê
armancê ez çûm sikefta tarî û min hal û wexta wan kesan pirsî. Ew
bûyerên ku li Sêrtê min
dîtî, ji wan re jî min qiset kir. Ji xwe tirsî mirinê wan dîl girtibû, êdî
nedizanîn çî bikin. Li wê
sikefta tarî de, rojek ji bo wan salek bû, seetek jibo wan mehek bû. Wext
li wir sekinî bû, bi
tenê tirs hebû. Sarêxan û wan kesên din jî dixwest bi demekî kin de
bikevin li ser rê. Ji tirsî
rûyê wan zer û ji bêxewî jî çavê wan sor û rûye wan miçiqî bû. Ma dijiberî
wê hovîtiyê ewê
çawa ne tirsîyan û ne qehirîyan. Her çiqas ez xemgîn bûm jî, lê min
dixwest hevîyê wan ji
rizgariyê re bilindtir bikim. Ji xwe li vê dinyayê bi tenê bawerî û hevîya
rizgar bûna wan ez
bûm. Wê xwe ji bo sev amade bikiran û emê bi rêketan. Pistî demekî ez ji
wir vejeriyam û
hatim mala xwe. Min jî êdî xwe amadeya rêwitiyê fikir û hin hacetên ku
di rê da pêwistiya

me bi wan çêbûya min amade kirin. Ji xwe keleka li ser çemê dîn û har
her dem ji bo rêwîtiyê
amade bû. Tarî hêdî hêdî xwe li ser xwezayê radixist. Bi tenê heyv û stêrk
hisyar mabûn û li
benda rewitiya me bûn. ava çem ji xwe ji doh ve amade bû ku me li ser
pelên xwe yên bi hêz
rêbike heya Mûsilê.
Ez bi hêvî û dilgermiyê ber bi sikefta tarî ve bi rê ketim. Ji hawir dor tenê
dengê çirçirkên
sevê û dengê ava har dihat gûhêmin. Çavên min li ser hawir dorê
digeriyan. Li her der di nav
tarî û seqemê de bû. Ber bi sikefta tarî ve mesiyam, find pêketî xûya dikir.
Mixabin ew
ronahiya sewatê bû. Bîhneke ecêb û cûda ji sikeftê dihat. li ber wê bîhna
gemar mirov
nedikarî bisekine. Tirsê ketiyê dilê min qewimî bû. Sarêxan û hemu zarok
û xismên wê, li wê
sikeftê de hatibun kustin. Sikeft da bun ber agir, min nezanî kengê û çi
wextî li ser van kesan
de hatine. Lê minê ji kî ra bigota, ji xwe ew emanetî min bun...
Sofî ji sewitandina van kesan xwe ber pirsiyar didît. Ji bo vê yekê jî ji kerba
van mirovan
çû ser dilovaniya xwe, pistî mirina wî gelek kes jî derheqê Sofî de digotin.
Sofî cihê wan
nîsanî leskeran daye ji bo vê yekê jî hinek kes lanet li Sofî dibarandin,
mixabin ne wisa bû. Lê
kesek jî nezanî ka çawa ji wan kesan agahdar bune...

Xalê Saleh jî xemgîn bûyî stûyê xwe xwar kirî li kêleka min rûnistiye.
Bîranînên wî, ew
êsandibûn û bêdeng mabû. bîranînên xwe ji nû ve jiyabû ji xwe ew jî kal
bûbû û li benda
mirinê bû.

**

BALAFIRA JÎNÊ

Zeynelabidîn Zinar

Balafira Jinê

çîrvanok

Pencînar

Weşanxaneya Çanda Kurdî

Stockholm 1993

Pencînar

Kurdiska Kulturför1aget

Weşanxaneya Çanda Kurdî

Box 3088. 16103 Bromma

Slockholm-

SWEDEN

Zeynelabidîn @

Balafira Jinê 1993. çîrvanok

Wêneyê Berga Pêşî: Kemal Heyran

ISBN 91 972090 3 1

Diyarî bo giyana herdu blayên şehîd Îsê û Haco

Zeraqiyên tavê hêj xwe negihandibûne

serê serçimka çiyayên bilind. Di wê kazima sibeha

zû ya berbeyanê de, welê qebeqeba kewên ribat

xweşexweş ji dormedarên lat û zinaran ve dihate guhên şiyarên di nava livînan de. Pê re jî xuşîna bayê hênik xwe li derî û pencereyên malan dixist. Yekcaran kevokên sipî ji tirsar başokan direviyan û xwe di nava kuçe û kolanan re bera xwarê didan, ew ji bo ku nebin êm û alifê wan hinekan xwe ji hewlerihan li pencereyên vekirî dixist û diketin hinduriyan û tê de xwe ji ber zilma zilmdaran diparastin. Ji kevokan zêdetir, çivîkên malane jî gava ku çav bi wî şerê li asîmanê sayî diketin, ji tirsar direviyan û xwe dixistin qul û qewêreyên kujînekan, tê de dihêwirîn.

Dema ew şer û qaleyên giran ên ku di navbera teyr û trûdan de çêdibû, hêj xelkê bajêrê Pêncşayê bi tamamî ji xewa xwe ya şêrîn şiyar nebûbû. Ji ber ku xewa wî bajêrî pir xweş û şêrîn, gelekî sivik û nazenîn bû. Lewra Serbajarê

5

welatê Pêncşayê. Li navrasteke rajorî Çiyarêza Çiyayên Zincîrqiranê dima. Şûna wî welê bilind bû ku piraniya dinê jê ve dihate xuyakirin. Hertim di çaxê germiyanê de bayê hênik xwe lê diafişand û di jivistanan de jî berfa pûk hertim lê gerremol dibû.

Bajarê Pêncşayê sê aliyên xwe bi dîwarine bilind ên honayî ve ku ji berên reş hatibûne dormedarkirin vegirtî bû û bedena taqê rû xwe

hevraz hil<lişikande tangava hinek çiyapozan.
Bilindiya bedenê welê bû ku tîrên serpolayî jî
gava ji kevanên mifriqî bi jiyê dihilatin. xwe
ne digihandine serê qora jorîn. Li ser wê bedena
bilind î qalind. kalikên nobetdaran bi rêzê xwe
ramî êkdû dikirin.

Her û daîm di wan de helegurên nîşanvanî yên
derzîhingêv. çavrêniya
awirine tûj î di xirab dikirin û çek û berên
parastinê ji xwe dûr nedihêlan. Di piraniya
şevan de gava ku wan şûrên sibhanî yên dudev bi
milên xwe ve dadileqdin. saweke giran dixistine
hinav û dilên dijminan. Ji ber bêbextiya tarîtiya
şevê. ha ku te dît namerdin li wana rast bihatina
û dest bi dest ew biketina pêsîra hevûdu. ewçax
ne tîr pere dikirin û ne jî kevan biha didane
merdaniyê. Lê belê şur û mertalên Serhedî zû
kewa birîna nehêsayî li wan hêsan
dikaribûn

bikirana. Ew leşker. serbaz û serdarên bajêrê şên
digel nobetvan û notirvanên dilovan tev ji bo
parastina Bajarê Pêncşayê û bo paşayê xwe
6

Baroz Paşa, bi şev û rojan amadeyê bo derketina
ceng û qaleyê ji nedî ve radiwestiyan.

Barozê Paşayê bajarê Pêncşayê zilamekî pir
ciwanmêr, gelekî dilovan, wisan jî nandayî û
çavfireh bû. Navûdengê nandayîna wî li her sê

beşên bejayiya dinê belav bûbû. Her rojeke ku dibihurî, çûn û hatina li mêvanxaneyê wî pir û pir zêdetir û zahf tir dibû. Her roj, her gav, bi sedan, bi dehsedan siwar û peya, ji welat û şaristanan ve dihatin serdana wî û ew pîroz dikirin. Ji ber wê yekê navûdengê wî gelekî zû bi camêrî, bi mêvanperwerî û bi mêrxastî li qada camêriyê

bicîh
dibû.

Herweha ji nandayînê zêdetir jî, ew mirovekî wisan peyvxweş, halko nefspiçûk, welê devliken û xweşaxweş rûgeş bû. Dev û lêvên wî mîna ku şîr û şerbetê dibarînin, hertim ter û nerm bûn. Ew hîç li kesan bi dilnepakî ne difikirî, xêrnexwaz nedibû, bi dexezi nedilipikî û di rada pêşî de jî gumana xirabiyê ji kesî nedikir, ta ku xirabî ji hinekan nedîta. Wî hertim dixwest ku her kes mîna wî bifikire û weke wî bilipike, heta ku bi av û axê re têkil bibin, her bi jîndaran re qencî û alîkarî bikin. Aliyekî bajarê Pêncşayê, bi qederê pêncsed gazan dirêj, vekirî bû û li wir diwarê bedenê nehatibû honandin.

Binê wî aliyê vekirî zinêr bû, zinarekî welê bilind cihê xwe digirt ku bi dehsedan gav hildikişiya. Di qul û qewêreyên

7

taqê zinarî de gelek hêlînên teyrik û bazan

hebûn. Gava siya êvarê xwe bera ser ruyê zinêr dida, ew teyr û baz mîna ku bi hevûdu re kêf û colan bikin, li nava hev radipiçikîn û qîşteqîşt û nalîna wan bi asîmanan ve dihilat. Wey kêf û kêfdarî lê be ku biçûna wir û guhdariya wan nexme û awazên niklxweş bikira.

Di binê zinarê bilind re, Çemê Qolincê timî lemelem dikir û bi bez dibihurî, herdem Îrefir jê dihilat û cewrên masiyan xwe di gola Gerînekê ya di binê qurma zinêr de dihilavêtine ser pişta hevûdu, bi êkdu re dileyiztin û kêfa xwe dubare dikirin, ta ku reşayiya şevê ruyê herêmê qemer dikir.

Çiyayên Zincîrçiranê çiyarêzeke pir dirêj, wisan bi dar û daristan, bi kanî û zozan, tije avzêm û cimik bûn. Wî xwe bi gelek sîpanên sertûj xemilandibû û her mîna rêza dawetê, serçimkên xwe li dû êk dibezandin; welatê xwe ji Rojhilatê hetanî Rojavayî seranser vegirtibûn û di nîvê xwe de geliyekî kûr bi cih danabûn. Aliyê Bakûrî, hertim weke zivistanê, sar û seqemê li xwe digirt û di havînan de ji bo koçertiyê nola bihişteke baxçeyên Îrema Botan radixist. Lê aliyê Başûrî, hertim germ û germiyan bû, di havîn û biharan de rûçikên xwe yên xweş rapêşî mirovan dida û curbicur fêkî, meywe û zebze di nava cergên xwe de diafirandin.

Çemê Qolincê bihêsanî ew Çiyarêza Çiyayên

Zincîrîqiranê

di nêvî de, her wekî mîna derba
 xencerê kiribû du qeşt û riya xwe tê de vedikir.
 Çem, timî bi bez û colan serejêr diherikî, her
 dilewlibî û bi bez diçû, ta xwe digihande nava ber
 singên Deryaya Bêmeferê. Herweha li herdu
 keviyên xwe rasline piçûk çêdikirin ku li hin
 hindaman bîst gav, li hin deveran sed gav û li
 hin ciyan jî çil-pêncî gav, hetanî bi qurma çiyê
 dirêj hêlabûn. Li wan rastikan, xelkê Bajêr ji
 xwe re baxçe û bostan çêdikir û tê de şînayî, zebze
 û darên fêkî diçandin. Li keviyên wan bax û
 bostanan darên Hewr û Bî, yên Spîndar û Benav
 xwe hevraz hildikşandin û bi bilindiya pozikên
 çiyayên bilind re hevrik dibûn û timî xwe sîqal
 dikirin. Lê ji quntaran û ber bi hevrazî ve darên
 Mazî, yên Berû, Kevokl. Bitmik û Keniran xwe
 direqaflîne êkdu, taca serê xwe li hev dilefandin
 û mîna xaliyekê ketibûne navbera erd û asîmanê
 bilind. Dema mirov li ser pozebilindekî Çiyê li
 herdu berwaran binerîya û ji jorê ve jî ku hatina
 ava çem didît, şadiyeke zêde xwe dadixist nava
 cerg û dilan, kêfxweşiyê ew dihingavt û jiyaneke
 teze xwe dixiste binê zimanê giyana melûL. Erê,
 bi wan ber û tentêlên Laleşî, tu kesî nizanibû ku
 çewa zamanê dirêj dibihure, ageh ji şev û rojan
 nedima. Her kes hema li berg û biruyên kevanî

heyran dima û ziloq dibû lê dinerî, heta ku
keçika çavan ji nerîna Lê diqerimî û diwestiya.
Jixwe bêguman e ku teswîrkirina wê bergê, ne
9

ziman dikarin bînine ser lêvên sivik, ne jî hiş û
aqilên giran dikarin wê xweşî û delaliyê di nava
xwe de rabigirin û bikin mêvan an jî naveroka
wê deverê li x\ve bihêwirînin.

Gava bayê hênik ê wê xwezaya dûrê ji nepakî û
qirêjiyan, xwe li bêvila ganî û kêlikên rizî
dixist, bi bihdariyeke xweş giyana ganiyan
dûvedirêj dikir û laşên bi afirandina ji xwîn û
goştê nazik pir dişidandin, ew disîqirandin û
gelek jî dihe'oandin, ta ku sersaliya salên sedî
dixistin navbera xortanî û navseretiyê. Hestiyên
rizî jî di qesrên cebanistanê de rind diparastin û
pawaniya wan bi hezarsalan dikir, da nifşên
demepêşê gava li bapîrên xwe lêkologtî bikin
qenim rind zanibin ku tîp û tewra hestî û bejna
lawan çilo bûye.

Li bajarê Pêncşayê her sal heftiyek piştî
Newroza dilxweşan, pêşangeheke pîşeyî vedibû.
Di nava hunermendên bajêrê gewre de kesê ku
tiştêkî nûjen afirandibûna, dianî pêşangehê û
pêşkêşî çavên serdaniyan dikir. ~eyeta jûriyê jî
piştire ew tişt hemû bereçav dikirin û li gorî
delaliya wan, bi têgihandina bo zîrekîtiya

xwedyê wan, tiştên rindtir bi rada yekemîn,
duyemîn û siyemîn destnîşan dikirin. Dû re
Baroz Paşa jî diyarî didane aferîndeyên tişan
û ew xelat dikirin.

Di pêşangehê de ne tenê alecî, herweha ji
Herêmên cihê cihê yên dinyayê jî pir kes

10

dihatine wir û tiştên xwe yên nûafirandî rapêşî
çavan dikirin. Bitaybetî ji ber wê yekê hîn zêde
çûn û hatina Serbajarê Pêncşayê qerebalix dibû.
Wisane rê û rêwî Lê digihane hev ku ji riyên
hemû welatên dinyayê ve serbiser li dilef1yan.
Di wan rojan de bazirganî û bazara sê herêmên
dinyê tev li wir digiha ser êk û dest bi kurrîn û
firotinê dihate kirin. Piştî ku pêşangeh li
dawiya xwe disekinî, bazirganên biyanî îcar ji
wir gelek malên alecî weke cawê Apikanî,
qumaşê Xerzanî, şalûşapikên Botanî, hevrîşimê
Reşkotanî, pembûyê Silîvanî, tiftîka Serhedî,
hiriya Şêrwanî, keja Torane, çermê Badikanî û
zadê Deştê Bişêriyê dikurrîn, û bi xwe re dibirin
û ha yela berê xwe didane rê, her yekê diçû welatê
xwe.

Baroz Paşa ji wan bazirganên biyanî baceke
hindik distend û pê welatê xwe xweş û şên dikir.
Ji ber wê yekê. bi qîma dilan Serbajarê Pêncşayê
dewlemendtir dibû, her ku diçû dewlemendiya
xwe zêdetir dikir û pir xweş, boş û şaneşîn dibû.

Bajêrê şên xwe ji dinyayê re kiribû mîna keleha ribatan, wek mazateke navnetewî ya êminatî û biratiyê. Bi wê fûrepêrta zêde serwet û maldariya dewleta Baroz Paşa gihabû sînorekî wisan zêde ku ne dev dikarin salixê wê bidin, ne jî zimanên bêhestî dikarin riya xwe têxine nêv kûrayîya wê gerîneka şirşarê.

Erê, her çiqasî Baroz Paşa. paşayê serbajarê

11

welatê Pêncşayê bû jî û kêf û serweta wî bi qîma dilê dilxwazan di şûna xwe de cihgirtî bû; welatê wî jê re mîna bihişteke Îremî bû û xelkê wî jê re gelekî rast î dirist bû. Lê ew kurdûnde bû; ji jina wî Binefşa delal re re zarûk çênedibûn. Lê nizanibû jî, ku ka gelo kêmasî jê ye. yan ji jinikê ye! Eger ew kêmasî ji jina wî bûna. çare pir hêsan dihate çareserkirin. Wê ji xwe re jinekê anîba. Lê eger ew kêmasî jê bûna. bêlome bî Xwedawo! Ne dikaribû ku jina xwe berde. yan kariba bi awayekî ku jinikê ber bigirta dermanekî biafirandina û derdê bêlome lome bikira.

Baroj Paşa ji ber kundûrdetiya xwe timî hergav di nava malê de mirûzdayî. stûxwar û dilşikestî bû. Jina wî Binefşê jî her wisan ... Paşe timî difikirî; roja ku bimre. dê malê wî, taca wî. serweta wî tev bêxwedî bimînin û dibin malê mîrate. Ji ber hindê ziyaretek nemabû ku wî jina xwe Binefşa bedew nebiribû serê û jê hêviya

çêbûna doleke nêr nekiribû. Herweha şêxek.
mişayixek nehiştibûn ku ew neçûbûne cem wan
û ji nivîstekê ya ji himayîlekê yan jî bazbendekê
nedabûne çêkirin. Jixwe bizişkek an hekîmek li
welêt nehiştibûn ku xatûnê nebiribû cem wan, da
jêre sersedemiya peydakirina dermanekî
bikirina. ku Yezdanê dilovan da bedena wê terr
bikira. Lê ew hewqas geriya û negeriya tu çare
nedîtin û dermanekî ji jina xwe re peyda nekir.
Ha wisan Paşe bêteled. bêweled û kurdûnde
12

mabû. Ji ber wê yekê pir li ber xwe jî diket, xwe ji
hempayên xwe kêmkirî didît. Ne tenê li hemberî
paşe, keya, xwendkar û xuyaniyan, herweha li
pêşberî hemû zilaman jî xwe kêmkirî dihesiband. Û
pir disêwirî, pirtir difikirî û şev û rojên xwe bi
axîn û oxîna bo kurekî ku Xwedê bidana Binefşê
dibihurandin. Erê, da qenim kîjan roja ku ew
bimirina Jî hîç nebe malê wî, serweta wî mîrate
nediman û li dû xwe warekî şên ava dihişt,
herweha deriyê wî dê vekirî bimana û mûma wî
venedimirî. Ji van hemûyan zêdetir û gelşa herî
giringtir jê re ev bû; piştî mirinê tunebûna
mîratxurekî wî yê ku dê li şûna wî, li ser kursiyê
wî birûniştina û taca zêrîn bipolaristina.

Ji Baroz Paşayî re tim û daîm xweşî û reşiyê bi
êkdu re şer û qirên dikirin, hev dihingavtin û li
pêşberî paşatiya wî ji hevûdu re radibûn pêdarê.

Îcar geh xweşiyê zora reşiyê dibir, gahî reşiyê zora xweşiyê dibir. Ha wisan ew û jina xwe Jî di mabeynê de naçar diman û dimirûziyan. Her ku diçû, Baroz Paşa ji çêbûna zarûkan bêumîd dima, êdî hew li derd û dermanan geriya û xwe li pêşberî çarenûsa xwe melûl hişt. Lewra wî rind bawer kiribû ku hebe tunebe hicrana heyî JiJina wî ye, ne ji wî ye ku zarûk çênabin. Lê ew hîç ne difikirî Jî ku dibe hin zilam jî hene ku zarûk ji havênê wan çênabin. Û wî hîç ew guman nedixist hişê xwe, ew kêmasî nedianî ser parsuyên xwe û yekalî diçû. Hertim sûcê giran

13

dixis stuyê jina xwe ûyekcaran çavekî hor Lê dinerî. Îcar ji ber wê bêrewatîyê her ku diçû, navbera wî û Binefşê xirav dibû, nexweşiya malbatî silava xwe ji wan kêm nedihîşt û ji êkdu her bi xeyd û mirozdayî dilipikîn. Lê li ser wê yekê jî Binefş xatûn pir ji malxweyê xwe hes dikir, bê wî hîç semax û debar pê nediketin. Bêguman neanîna zarûkan jî ew bi qîmê teyişandî hiştibû û di dilê wê de xewêrene fireh vedikirin. Rojekê xwe bi xwe xatê na delal sêwirî; gelo ez çi bikim, çi nekim? Her çendî ku hêwîti zehmet e, pir zor e û tu jin nikare mêrê xwe bi yeke din re pişk bike jî, lê kurdûndetiya Paşê û stewrtiya min ji her tiştî zortir in. Xasma ez, timî di nava xelkê de, her çiqasî jina Paşê me jî

lê li pêşberî jinên der û cîranan stûxwar
dimînim û kêmik tême hesibandin. De ez ê hema
îşev jê re pêşniyarekê bibim, da qenim ji xwe re
jinekê bîne. Belkî ha te dît ku Xwedayê comerd
hema tifalekî dayê. Ewçax ez jî ji binê webalê wî
difilitim û wijdana min hêsan dibe. Lê ka ew şans!
Êvarê dereng, mîna hemû caran ev car jî gava
Baroz Paşa derbasî oda xwe ya razanê bû û çavên
wî li Binefşê ketin, kir û nekir nikaribû çavên
xwe tê rabike û berê xwe jê vegerand, xwe bi
vekirina bişkoke û xulpoqan ve mijûl kir. Lê
Binefşê, berî hatina wî, ew şev xwe bi dermanên
Dilhingavtinê kiribû mîna şorba nexweşan,

14

herwekî pîvokeka biharê be jê tîrêjine dilqestî li
nava odê belav dibûn. Lê dîsan jî li wir melû1tî û
bêdengiyê xwe rind bi cih kiribû. ne pêjn ji kesî
dihilat û ne jî devê wan qul dibû û jê peyvek
derdiçû. Bi wî awayî demekurtek bihurî. Binefşê
bê daxwaza ji nava dilê xwe ber pê ve çû:

- Paşa. Em wilo bê zarûk dibin. qey?
- Ma ez ê ji te re zarûkan bînim?
- Heyran. Ji xwe re bizewice. Belkî hema
Xwedê bedena te şî kir!

Bi wê gotinê tirpîniyek ji dilê Paşê hilat. madê
wî vebû û berê xwe vegerande ser Binefşê:

- Tu rast dibêjî. keşê?
- Erêêê weleh. ez rast dibêjim û ji nava dilê xwe

yê safî derdixînim.

- Ihiiimmm ...

Piştî kenê xweşlêvan û bişirandineke hêja.

Baroz Paşa herdu guhên xwe miç kirin û dane ber wê pêşniyara Binefşê. Dû re serê xwe tewand erdê û di ber xwe de fikirî. gelek sêwirî û qasekî xweş ramiya. piştî xwe bi xwe got: Ez û Binefşê eve bîst û du sal in ku bi hevûdu re zewicî ne. Me hewqasa bi saline dirêj re serê xwe digel êkdu danîne ser yek balgîvê û emekdariya me zêde bi hevûdu re çêbûye. Niha ez ê çewa rabin û herim jinekê bînime ser wê. Jixwe ne lihaş e ku gotine derdê hêwiye giran e. ger hêwî mêşek be li kutekê jî êşeke pir giran e. Îcar ew bê ku hay ji xwe bimîne. hema ji nişka ve qêriya û bi dengekî

15

berz got:

- Naaa!.. Binefşê, ez nazewicim û çu hêwiyanjî nahênime ser te.

Lê Binefşê bi nabûna wî re kelogirî bû û hêdîka xwe ji binê lihêfê kişande der, rabû ser nigan û hûrik hûrik giriya, heta ku çend stêrkên şor bi ser hinarokên ruyan ve jî daweribandin.

Paşê û jina xwe herdu jî di wê şevê de dilteng mabûn û her ku çû ew diltengiya wan werpixî, nepixî û giha nêzî teqandinê.

Li wan gelş û nexweşî her domand û mirûzê wan zêdetir li pêşberê heh hate kirin. Lê diviya ku di nava

xwe de bigehana encamekê û biryareke diyar bidana.
Eger ne wisan bûya, kî çi dizane belkî wê hingê
siqûmateke giran jî biketina ser wê şeva bişînî.
Û destên Binefşê hîç ji mêrê wê venedibûn,
Dilê wê ji kelefûra heskirinê sar nedima û careke din
berê xwe bi ser ve bada:

- Na. Tu yê bizewicî. Hema belkî Xwedê warê te
şên kir. Eve ez jî serfiraz dibim û tu jî şadan dibî.

- Hirmet. Temenê min bihurî ye, ez qert im êdî.
Eva wele ez nikarim bi jinebiyekê re bizewicim,
lê bo min pir fihêt e jî ku ez bi qîzeke çardasalî re
bizewicim.

- Nexwe ez ê ji te re yekê bibînim.

- Ê wele nexwe hema min qebûl e.

- Bi soz:?

- Erêêê, bi soz û sed carî ...

Piştî wan galegal û axaftinan, îcar bayekî

16

germ xwe bera nava hinduriyê oda rake tinê da û
bi dilekî şadanî,

bi lêvine xweşik û zimanekî

germ li axavtina bi êkdu re domandin. Ew şev
piştî bihartina şewbêrkeke nîvdexleyî Binefşê û
Baroz Paşa weke caran dîsa serê xwe danîne ser
balgîvê pirtikan û ketin xewa dilşadiyê. Lê pa
xew li kur û Binefşê li kur! Her du jî her yekê
mîna ku di xew re çûbin, geh xwe bêpêjn kirin,
yekcaran bi vir ve, ha bi wir ve xwe gemirandin

û pixepix, firefira xewê Ji gewriya xwe derxistin
holê, mîna ku ango herdu jî raketibin êkdu
xapandin. Lê wan bi hevûdu dizaniyan Jî ku yek
ji wan jî ranezaye. Ê li pawuka banga dîkê sibê
mane sekinî. ..

Ew şev di nava ciyê wan de li aliyekî geşt û
geryana bihiştî hebû û li aliyekî Jî gef û gurrên
dOJeya nemerdan xwe li cergên xatûnê dihilavêt.
Erê hêwîtî zor bû, lê Jê zortir neanîna zarûkan
hebû. De her çi dibe bila bibe, her kes di serê xwe
de dinyayeke li gorî daxwaz û qada xwe diparêze
û xatûnê jî her ew dinya ji xwe re parastî dihişt,
heta ku qîqlîlîlî bi dikên şevê ket û herdu ji
nava ciyê xwe rabûn. Baroz Paşa hêj di zûtiya wê
sibehê de derabû kincên xwe wergirtin û xurînê Jî
nekir, derket derve û çû serayê. Binefş xatûn Jî
li xwe kirin, çû ber neynika
kincine rengareng
bîroyê û xwe têrderman kir, bereJêr çû qatê binî
û gazî qerwaşa xwe Gulsîmayê kir:

- Keça min. Paşe vê sibehê zû derketiye. Tu

17

were bi min re taştê bixwe.

Gulsîmaya qerwaş, di temenê xwe yê
şazdesaliyê de li jiyanê didomand. Bejneke zirav
a narîn Lê hebû ku şitla rihanê jî xwe li berê
ditewand û jê re rêzan dibû. Dev û lêvine şekirî
xwe Lê kiribûne mazûrvan ku yekî digot hema

firişteyêke bihiştê Laleşê ye û bi karxezalên li wzanên Botan çêriyaye. Lê jixwe çav û brûne reş î qerqaşî, hemû xortên taxê bera çol û pesaran dabûn. Mîna ku tu ne bixwî, ne vexwî û rabî, rûnî hema bi şev û rojan li bejn û bala wê narînê binerî.

Piştî wê gotina Binefşê, Gulsîma di dilê xwe de sêwirî; helbet hicranek di vê yekê de heye, lê ez nabêjim na, ka binerim wê çi jê derkeve.

- Bilabe, xatûna min.

- De wer, keça min.

Binefşê û qerwaşa xwe li ber maseya mermerîdane ser kursiyan û dev bi xwarina hingivê teze û nivîşk bi nanê sêlê re kirin. Hêdî hêdî hem li xwarinê domandin û hem jî Binefşa Paşê xwest ku ew mesela şevê jê re bîne ser sifra xwarinê.

- Gulsîma. Keça min. Tu hêj nehsalî bûyî, hatî li ber destên min dişixulî û heta niha jî dişixulî.

Ez dixwazim tiştêkî ji te re bêjim, keça min.

Lê tûka Binefşê di qirika wê de asê ma, hinek sekinî û mîna ku firdik pekiyabin boriya nefesê çend caran iheih û kuxekux kirin. Erê, wê fedî

18

kir ku li ser sifra nêr rastiya meselê bêje qerwaşa xwe. Ha wisan bêdengiyê xwe qederekî dirêj ragirt û piştê Gulsîmayê ew veciniqand:

- Xatûna min. êêê?

- Keça min. Tu jî dizanî ku zaruyên Paşê nînin. Herhal hebe tune be. wê hicran ji min be. Eger ne wisan be jî. ew dixê situyê min. Îcar ez dixwazim ku Paşê ji xwe re bizewice. Lê heke ew rastî jineke bêbav bê. wê zû min ji malê biqewirîne. Îşev min gotiye Paşê ku. ez ê ji te re keçekê bixwazim. Îcar min ray li te dîtiye. Hema bila Paşê mehrekê bavêje ser te û ji xwe re tu ha wisan herî-werî. ka hetanî Xwedê deriyekî xêrê vekir. Tu dibînî jî ku mal têr û tije ye. Tu dikarê mala diya xwe jî bi xwe re xwedî bikî. Û ez ê destên te tije bazin bikim. xirxal têxim nigên te û ez ê bikim ku situyê te ji qolanên zêran xwar bibe. Erê. keça min?

Gulsîmayê di dilê xwe de hîç bawer nedikir ku şanseki wisan rastî wê bê û bikeve nava heyyê. Lê di dilê xwe de sêwirî; eger ev tiştê ku xatûna min dibêje rast be. ez ê kêf bikim. Te dît ne beredayî gotine: "Bike kala. bixwe mala." Lê ez ji vê sihûda xwe qewî bawer nakim! Piştî hinek bi şermokî.

Hinek bibêbawerî.

Hinek jî bi daxwaza ji nava dil û hinavan serî li xatûna xwe vegerand:

- Xatûna min. Divê ku pêşî tu ji diya min re bêjî.

19

Lê dîsan jî qerîaş kete nava xewn û xiyalan û

vê carê li îşê zewacê ramiya; heke mêrê meriv ne xortekî jêhatî bem. tu tam û zewqa wê namîne.

Jixwe Paşê xortaniya xwe di Binefşê de ko kiriye. Îcar wê ji min re çi mabe! Lê dibe ku ew zû bimre. ez ê ewçax ji xwe re xortekî bikim. Na wele. ma ewçax wê xort bi min qayîl bibin? Na. ne jî kes diwêre ku min ji xwe re bibe ...

Piştî xwarinê. Binefşa Paşê rabû çû mala diya Gulsîmayê. Û Gulsîmayê jî mîna hercar rabû dest bi firaqşoyê kir.

*

Çaxê Belalîza diya Gulsîmayê dît ku wa jina Paşê hate mala wê. ji xwe re heyirî ma û gelekî şaş bû. Lewra heta wê rojê jî neçûbû mala wê. Rabû jê re qedr û giramiyeke zêde mezin girt û ew bir lijora odê. li ser doşeka hirî da rûniştandin. Piştî Belalîz xanim çû qahwe keland û anî da destên xatûnê. Hêj qurta pêşî li qahwê nexistibû. bi ken got:

- Lê. lê! Belalîz. xweha min. tu dizanî ku îro ez bo çi hatime vir?

- Na xatûna min.

- Ne. ez hatime xwezgînî.

- Ma kurên te hene?

- Na wele. Ez hatime Gulsîmayê ji mêrê xwe re dixwazim.

20

- Weyla li min kezîkurrê,

dêranê! Kes li xwe
weha dike?

Bîstikekê herduyan bi hevûdu re tiqetiq kirin
û bi ken û lepelepa lêvan re mijûl bûn. Piştre
Belalîz kete nava xewn û xiyalan, gelekî kûr û
hûr fikirî, xwe bi xwe got: Dibe ku niha Paşê
tişteki nepak jî bi keça min kiribe, lewra ev
hatiye wê jê re dixwaze! Ê lê vegeriya, dîsa eynî
ew gotina pêşî dubare kir:

- Wî, li min kurrê! Ma kesî dîtiye ku jinek çûye
bi destên xwe hêwî anîbe ser xwe?

- Eva ez! Lê, lêêê! Ne, zarû ji min çênabin. Êcar
Paşê jî gune ye ku kundûrde
bimîne.

Ez pir

dixwazim ku bedena wî şîn bibe. Belkî hema ez jî
xwe bidim binê siya wê dara şên û ji xwe re
bisitirim. Qenim bila neviyekî te jî bibe paşê û li
şûna bavê xwe rûne. Ma qey ne wisan e?

- Xatûna min. De tu jî dizanî ku zarûkên min
tev sêwî ne; ne bav heye û ne jî xizmekî wan heye
ku ez herim pê bişêwirim. Êcar madem te ray li
vê yekê dîtiye, hema raya min jî mîna ya te.

Binefşa jina Paşê destê xwe li qolana kemberê
da û jê çengek zêr deranî, da diya Gulsîmayê.

Belalîzê jî ew zêr ji destên

wê girtin,

xistin

kûrika xwe û piştire çû destê Binefşê maçî kir û sê caran li eniya xwe da:

- De ka nexwe em xweşbêjekê jî bixwînin.

Herduyan destên xwe vekirin û ber bi jorê ve hildan, çend payvên xweş û çak bi dev û lêvan
21

seredor kirin

kefa destên xwe li ser û çavan

Û

hesikandin. Bîstikekê şûnde Binefş xatûn rabû xatir ji Belalîzê xwest û şûnde vegeriya çû malê. Erê. Ji wê rojê û şûnde Gulsîmaya qerwaş êdî bû xwediya malê. Lê xatûntiya wê pir nihênî diçû û tu kes pê nehisiya ku Paşê ew mar kiriye. Dîsa ew her mîna berê êvaran diçû mala diya xwe û sibehan zû gava dihate kar, pêşî diçû dikete oda Paşê û li kêleka wî rûdinişt. Hin caran jî nave rojan gava ku Paşê li mala xwe dima, dîsa diçû dikete oda wî û çend saetan pê re rûniştî dima. Ha wisan piştî çend xêr û bêran, Gulsîmayê dîsa radibû diçû firaqşoyê û dest bi karê malê dikir. ..

Di wê navê re du-sê meh bihurîn, çavên Paşê û yên Binefşa jina wî li belbûna zikê Gulsîmayê ziloq dibûn. Lê zikê Gulsîmayê ji piştta wê hişktir bû, barê giran ranedigirt û her ku diçû hişktir jî dibû. Ew rewşa bêdemî Binefşê û Paşê seredox

dikirin û bêumîdiyê zêdetir xwe li wan pêça. Lê ji Paşê zêdetir Binefşê li ber diket û zêvir dibû. Rojekê ew li Gulsîmayê pir fikirî û hema ji nişka ve dilê wê xewirî, elqên vereşanê hatinê. Paşê û Gulsîmayê rabûn ew kişandin ser doşekê û gazî hekîmê malê kirin. Gava Hekîmî Binefşa narîn berçav kir. nerî ku di xwîna wê de guhartinek çêbûye. Bi dilekî şad kontrol kir, erê dît ku ew ducanî bûye û zarûka wê sê mehî ye. Hema bi dengê bilind qêriya:

22

- Paşay! Mizgîna min çi? Jina te bi zaro ye!

- Na, kuro, wer mebêj!

Xewn û ramanên Paşê, bi derbekê Lê bûne

Ew li kîjan kaniyê difikirî ku

xewnerojk.

derbibe, Lêjê re kîjan kanî derbû. Kes nizane ka wê çi bibe û çi nebe. Heyhat! Eger Xwedê bi wê xwedatiya xwe karê jirêketyan sererast neke. ew nikarin karê xwe rasterê bimeşînin. Paşê. bê ku hay ji xwe bimîne. ji devê xwe pekand:

- Lê Gu1sîm ...

Mîna ku şewitîbe devê xwe zû rada û xeberdana xwe guharte ser ruyekî penî:

- Hekîm. Ka qenc binêre. Qey jinê pîr jî bi zaro dibin?

- Erê. Paşayê min. Jin heta çilsaliya xwe jî,

normal zarûk tînin. Eve Binefş xatûna min yek!
Erê ew deng li Binefşê pir xweş dihat, lê 11

Paşê

û Gulsîmayê? Hema xweş bû, qey! Lê gava ew
dengê bizarobûnê ket nava guhên Binefşê, hema
Binefşê herdu çavên xwe vekirin û dev bi girina
şadiyê kir. xwe bi xwe got: Min çi kir bi xwe! Min
mala xwe bi destên xwe xirab kir û ez rabûm
hêwî jî anîme ser xwe. Eger min zanibûya ku ez ê
ducanî

bibim, ez ê demeke din jî bimama

û

nediçûm kesî ji xwe re nedikirime ser û şîrîk. Lê
tiştê ku çû mede dû, tiştê ku bê rind guh bidê ...
Paşê jî her weke Binefşê di dilê xwe de digot û
disêwirî: Xwezil di şûna Binefşê de Gulsîmayê
bûna. Ev hewqas sal in ku min tu xêrdîn ji wê
23

nedît. Îcar bi vê pîrîtiya han. tavil zarûka wê jî
seqet çêbibe. Îcar jixwe ew yek ji min kê
dimîne. De haihah! Binefşê û bizarûbûn çi tevî
hev in?

Ji wan sêwr û xweziyên daxwazkaran zêdetir.
xwezî û daxwazên Gulsîmayê gelek tîn li dilê
kesirî kirin û bi sêwirandina; Xwedê carek
miradê sêwîyan. miradê miradxwazan zûbizû
hasil nake û şansê wan tu carê bi wan re nade

kenandin. Eger ne wisan bûya. ya terr û ciwan ez im. ya ku ji zarûkanînê re destdayî ez im. wê di şûna Binefşê de ez bizarû bibûna. Lê ka ew sihûd û heqbala min?

Deng û behsa bizarûbûna Binefşê zû belav bû. hem jî mîna ku hêstir bizê deng veda. Navûdengê ducanîbûnajina Paşê zû li nava bajêrê şên belav bû. Ew deng û behs her belav bû û ji hev teriqî. pij vedan. dengvedêrî kir û bi deşt û çiyayî ve beziya. Ta ku bi wî dengî guhên xitimî jî qul bûn û yê kerr bihîztin. pê re zimanên lal jî tevek vebûn. Ew "mizgîn" çû. heta giha miriyên li goristanan jî. Çavên kor û devên lal bi îşaret û dengên şahiyê re leqiyayî. Her kes bi meselê peyivî û yek mizgînê da yê din... Paşê rabû defa şahiyê da lêxistin.

heftiyekê xwarin û vexwarina

hemû

bajarvaniyan ji kîsê xwe da kirin û çiqas feqîr û

li herêmê

li razanxane

desttengên

hebûn.

û

xwaringehên dewletê dane bicilkirin. heta ku her neh mehên Binefşê li dawiyê sekinîn û bi xêr

24

Û xweşî

ket ber êşîka xêrê.

Gava mizgîna çêbûna kurekî ji Paşê re çû serayê, Paşe di civata encûmanê de dipeyvî. Bi şadiya wê mizgîna xweş, encûmanî tevek rabûne ser nigan û ji hatina paşayê nûhatî re ketin rêzaniyeke taybetî. Piştî raw estina wan ya bi qederê çend deqeyan, yekî pêşniyar bir ku ji

lêwik re navekî rind bibînin. Îcar bi biryara encûmenê, navê lawê Paşê danîn Gurgîn û xeysetê paşatiyê jî pê ve zêde kirin. Piştî her kesî got "Gurgîn Paşa".

Ew roj Baroz Paşa xwe ji kêfan re li ser nigan ranedigirt

û li wir hew semax kir, dixwest ku here lawê Binefşa xwe bibîne. Hema yekê nekir didu û Paşê rabû civîna xwe di nêvî de hişt derket derve, bi bez û lez çû malê. Gava lêwik di pêçekê de dît, stêrkên şahiyê di çavên wî re avêtin der û bi herdu destan rahişt pêçeka wî, ew da ber singa xwe û got: "Bavê bavê min. Çima tu wisan dereng mabûyî û nedihatî? Hewqas sal in ez li pawuka hatina te sitûxwar mabûm, lê diya te hêj ji min bêtir melisî mabû!"

Ew roj Paşe gelekî bi kêf, dilxweş û şad, pir jî şadan bû, Pêre, pêre guhartinekê xwe di nava

dilê wî de liba kir; geh dil lê ricifî û gahî mîna
şiva di nava avê de lerizî. Hem jî yekcaran
bişirî, lê pirê caran di ber xwe de kenîya. Binefşê
jî her mîna wî.,. Lê îcar Kezîbanê! Ew gelek
bêmad, pir mirûzdayî û zahf jî xemgîn bû. Mîna
25

ku xweliya porangê bi ser ve hatibe rijandin reng
xwe Lêdiyar nedikir. Lê belê hin caran ew ji bo
xatirê dilê Binefşê û yê Paşê, hem jî bêdaxwaz di
binê lêvan de dibişî û dikenîya. Di nava wê kêf
û xweşîya bêhempa de, Paşê mizgîneke din jî da
Binefşê:

- Tu zanî ku encûmaniyan
navê lawê te çi
danîne?

- Çi danîne?

- Pîroz be. Dêmek li navê Gurgînê
bapîr

danîne. Bi xêr û xweşî be, lawê min.

Baroz Paşa piştî ku bû bavê kurekî lewend, êdî
xwe paşayekî
bihêztir

dihesiband

û mîna

zilamekî dilsoj li xwe û li lawê xwe dinerî. Hem
jî ew hiskirin û şewata li ser zarûkan dilê wî pir
givişand, xwe bi xwe got: Rast e, heta ku zarûkên

mirov çênebin, mirov nizane hiskirina zarûkan
çewa ye. Erê, her çiqasî min zarûkên welêt tev
mîna yên xwe dihesibandin

jî, lê heta Gurgîn

çênebû,

hiskirina

zarûkên

xelkê bo min rind

çênedibû. Êdîji niha û şûnde ez ê bi çavekî din li

dê û bavên zarûkan

binerim, bi yekî din jî li

zarûkên wan ...

Du rojan piştî çêbûna Gurgînê Paşê, pêşangeha
bajêr vebû.

Piştî dawîlêhatina

wê, xwediyên

ewqas tiştên bihadar ên ku hatibûne hilbijartin

tevek ji Gurgînê re diyarî birin. Kiyê ku diyariya

xwe danî, Paşê deh lib zêr jimartin nava çenga

wî. Ji nava hewqas diyarî, kêfa Paşê zêdetir ji

26

firfirokekê re hat. Jina wî Binefşê ji ew firfirok
rind begem kir û jê re heyran ma.

Erê rast e, wek mesela ku dibêjin "Devî zû

dibin dar, xwelî li merivên bêwar." Êdî Baroz

Paşa

ne bêwar

bû,
ne kurdûnde
jî dihat
hesibandin û bavê lawekî bû. Hem jî lawekî
çewan! Cewrekî wisan delal î cindî, ku hema
diçû nava dilê mirovatîyê. Çi kesê ku wî didît, jê
re lêva xwe gez fikir. Lê diya wî hertim bi teniya
xacirgatî xetêke reş ji jora eniya wî heta serê
bêvilê û yekê jî li raserî birûyan bereber li eniyê
dikişand. Da qenim kes wî çavîn meke û hertim
serçavê lêwik di qilêrê de gemar dihişt,
şînokeka mezin jî bi pişta wî ve dadileqandin.
Lê ew yek li zora Paşê diçû û wî nedixwest ku
lawê wî têkeve wê rewşa qilêr a gemarî. De çi
bikira, feqîro! Lewra tore û baweriya herêmê di
derheqê gedeyên rindik de ew bû ku dihate kirin.
Ji ber hindê wî nikaribû xwe ji wê toreyê
bişûştina, xwe dûr bikira yanjî dest jê biqeriya.
Gurgîn hinbihin givrokî dibû ta ku saleke wî
qediya, gewde û bejna wî, bû mîna ya zarûkeke
sêsalî.

Ji
Gulsîmayê
re jî destûreke
pêgir
derketibû holê ku êdî ew bi şevan jî li mala mêmê
xwe bimîne. Timî wê Gurgînî bi pêlîstikên wî
Hin caran ew dibir derve û li

dida lipikandin.

nava bax û bostanan

digerand, yekcaran jî wî

dibire ber keviya çemê Qolincê û bi ava şên dest û

serçavê wî dişûştin.

27

Piştî çêbûna Gurginê Paşê. îcar Gulsîuayê Jî

c.,:avênxwe li anîna zanîkan digerland. Lê her

mîna ku alara bi serê Binefşê ve hat ibü bi ~crê wê

ve jî hatiye, ne bi zan.î dibü î ne jî di nava xelkê

de diyar dibü ku ew büye jina Paşê. Lewra her

kesî wê bi qeıwraşa mala Paşê dinasî. Ji ber wê

yekê. zahf dikedirî fl dizêvirî.

Gulsîmayê her mina qerwaşan dı mala Baraz

Paşa de li karê xwe yê qerwaştıyê domand. Di wê

navê re gele1\sal ü çendsalan jî êkdu hingavtin.

Gurgîn êdî mezin dibü, hem ji bü xorlikekî pir

bedew. serê simbêlên wî xwiş dan. temborîka

xwe şeh fikir, hin caran jî bi nihênî cüzCIn dida

ruyê xwe ü bi tena serê xwe cliçü li nava bajêr

dıgeriya, ji xwe re heval fl hogir çêdikirin Lê

bavê wi destûr nedida kll ew zêde lt derva bimîne.

timî ew dida taqîbkinn û parêzgehên tayhetî ji

dür ve ew diparastin.

Ew tişt jî pir li zora wî diçü

û dLxwestku bi tena serê xwe bigere; bo xwe heval

çêbike, devera ku bixwaze herê ü xwe têxe kirasê

xelkê, mîna zaruyên
her kesî li malan higer, li
civatên xelkê rûne û bi zarûkan re bileyze.
Gurgîn êdî çiv didane xwe u xwe Ji ber çavên
parêzgehan
nepenî
kir. çû xwe di enbarê
de
veşart. Li wir çeltikekî dît. Gava devê wî vekir ü
li navê nerî, dît ku tiştêkî xerîb tê ele ye. Hema
clevê çeltik girt û qulpa wî avêt milê xwe, çü cem
Gulsîmayê'

- Beko. Ev çi ye di vir de?

28

- Ez biqurban.

Ev. firfirok e. Gava tu hêj çilî
bûyî, yekî bo te diyarî anîbû.

- Firfirok çi ye?

- Meriv Lêsiwar dibe û difire.

Gurgîn bi firfiroka xwe pir şad bû, jê re gelekî
şadan û kêfdar ma û bire rastekê pê leyîzt. Îcar
Paşê jî yekî zana vebuhtî kir ku wî fêrî firandinê
bike. Piştî her çend rojan carekê ew firokajo pê
re diçû meydana Balafirgeha Jînê û ew lê siwar
dikir, heta ku lê biste bû. Yekcaran firfiroka wî
bi hewa diket û dîsa li erdê dadinişi. Hin caran
firfirok pir

bilind
dibû, ji reşû tarî diket û
careke din sernişîvî erdê dibû û bi xaz dihate
xwarê. Carinan jî ew bi tena serê xwe diçû û
li
firfirokeyê
difirand,
careke
din dihat
balafirgehê datanî. Her wisan Gurgînî sawa
firandinê şikand û tiraş dikir ku êdî bi tena serê
xwe jî bifire, li asîman here û were, dîsa şûnde
bête xwarê û li erdê deyne. Rojeke berêvarkî serê
Gurgînî
pir tevlihev
dibû,
hem jî çavên wî
sorexwînî bû bûn, gef û gurra wî pêlîdan dikir û
pişik lê diwerpixî. Xwe bi xwe got: Ma heta kengê
wê hinek ji min re alîkarî bikin? Qey ez ne mêt
im? Ku timî yek bi min re tê û min fêr dike. Wele
ez ê herim vê berêvarkiyê bi tena serê xwe qasekî
li hewa bifirim û dîsa vegerime malê.
Êvar dereng bû, dinya gelekî bi mij û moran
bü, hürîk-hürîk
baran jî dihat, rengê xunava
şevê xwe pembe dikir, geh sor dikir û gahî zer

29

dibü. Gurgînî çeH ikê firfirokê da milê xwe fı bi
 nihênî çü, giha navrasteke li keviya bajêr. Li wir
 perçeyên nrfirokê li hevüdü xistin fı Jê sıwar bfi.
 Firfirok bi hilavêtina cara pêşî re bi hewa kel tl
 firiya. Di wê gavê de bayê felekê jî xezeba xwe
 kê m nedikir ü ew rind hingavl, bi hewa xist,
 hevraz firiya ü çü ... Gurgîn kete navbera gerr ü
 gul1ên ewran, çavên wî xumam girtin, tirsê xwe
 lê diyar kir û hinbihin ji bizavê ket, xwe bi xwe
 got: Yê ku êl1îvegere malê, î~ev ne ez im. Gurgînî
 her çendî ku pîlê firfirokê bi xwar ve hada,
 firfirokê jî her xwe bi hevrazî ve bezand.
 Bîstikek neçû êdî xwe şaş kir, tîra bajarê bavê
 xwe wenda kir û nizanibü ka wê çi bike, çewan bi
 şünde vegere. Bêumîeliyê rind ew hingavt, hema
 xwe li ser piştê kire mîna zimûrik, rind şidand
 Lî
 bi milyaketan ve kel hêvî, hewar u gaziyan.
 Firfirokê xwe li wî laqê asîmanê banî li firê
 geş kir ü çü, çü hela ku ji reş tî tarî ve keL.Gurgînî
 gava li biniya xwe nerî, tenê rasteke sipî ya mîna
 beristanekê dît û li hin deveran ewrine reş jî xwe
 nîşanê wî didan. Ê ele ewr di ~evê de nixumî btîn,
 li biniya wan ~evere~eke pir tarî hebû. Dever jê
 re, cihekî biyanî bü
 wir ne rêwî hebûn ku ji
 Li

wan riya xwe bipirsiya, ne jî rê û îşaret hebûn ku
bî wan karibe riya xwe binase. Ha bi wî awayî, b1
wê lewrê çend saet bihurîn,
carekê bi nezanîn
Gurgînî pîlikê Jirfiroka xwe bi jorê ve hada. Erê
ewçax his kir ku firfiroka wî be1jêr dadikeve
bi
û
30

aliyê erdê ve şût dibe, ber bi gutla dinyayê ve tê û
ji aqarê ewran bihurî. Lê îcar çi bibîne! Dît ku
wa bajarekî mezin li biniya wî gerr vedaye. Lê
hema çi bajar! ku ne serî dixuyê û ne jî binî tê
dîtin. Aliyekî bajêr derya ye, aliyek çiya ne û
aliyek jî rastedûzeke bê serûber e. Firfiroka
Gurgînî bi pêl û serpêlên bayê geş re hinbihin
bejêr daket û çû li keviya bajêrê nenas giha ser
axa reş.

Şev pir tarî bû, ha wilo gelek jî serma, bi ba û
baran bû. Serma û seqem
li hev dihilatin
û
gurregurr
û guveguva firtonê xwe liba dikirin,
nedihştin ku bijangên çavan ji ser êkdu rabin,
yan ku xwe biniqînin. Gurgînê Paşê ji serman

tevizî bû, tîna germiyê di laşê wî de nemabû, her
deverên xwe bêrih his dikirin. Jixwe dev, lêv û
erçûmekên wî bi êkdu ve qerisî mabûn. Li wir
şaş ma ku wê çi bike û bi kur ve here. Bîstikekê
wisa ma, kefa destên xwe li hevûdu hesikand û
hinekî serçavê xwe firikand, çend caran xwe
qot1aniyê ser hevûdu kir û di şûna xwe de reqisî.

Hinbihin

qeşema

laşê

wî xwe bi germiyê

bediland û rih pê ve berjêr bû.

Lê piştî

demekurtekê gava li bajarê biyanî yê nenas nerî,
ji xwe re lê heyirî ma û di ber xwe de fikirî: ev çi
hat serê min, çi li min qewimî, de ka ez ê çewan
31

bikim? Xwedawo tu deriyekî xêrê vekî. Eger tu ji
ketiyan re nebî alîkar, wê halê wan çilo çêbibe?
Bi wan heyr û matmayînan ve, Gurgînî perr û
baskên firfiroka xwe ji hevudû xistin û di nava
çeltikê wê de bi cih kirin, çeltikî avit milê xwe û
bi nava kuçe û kolanên bajêrê biyanî ve bi leng û
lûkî kişiya.

Bajara de heyran tu çi bajar î. Mala xwediyê te
ava be gelo, yan xirab bibe! Mirov nizan çi bêje.
Lê her çi be. dîsan jî tu hertim şên bî. Lê şênî û

xweşî hîç li te nedixwarin; ji ber ku tu stûxwar,
belengaz û perîşan mabûyî, ha wisan jî ku te
bindest û perîşan hiştibûn.

Bajar, bajarekî pir mezin, wisan jî fireh, lê bê
plan û proje hatibû avakirin, ku mirov ferqa wî
ji çiyayekî bêxwedî nedikir. Xaniyên wî tev, bi
texte û berên bê serûber hatibûne lêkirin. Ji
derva ve dîwarên wan tev bi boyaxine rengareng
hatibûn nivîsandin. Kujînek jî ji qesel, qamîş û
zilan çêkirî bûn. Pencere ne teng û li pêşiya wan
şîşên hesinî dananî bûn. Li hawîdorê her malekê
bi textikan, bi kevir û kuçan, bi qederê bilidiya
metreyekê,

hinek

du metre

dîwarên

rakirî

hebûn. Di nava wan de baxçene xweş şênî didane
şevê û gulên rengîn weke sêwiyan xwe
reqaftibûne
ser hevûdu.

Li bilindayîyê,

daran

gerra serê xwe ber bi êkdû ve dirêj dikirin û her
diponijîn. Li ser her deriyekî nimreyek hatibû
nivîsandin û li keviyên wan peyarêne xirabe, bi

32

çêkirina sellên reş. hinek sipî û hinek jî sor xwe
ji mirov re rax.istibûn erdê.

Dilê Gurgînî bi çavpêketina wî bajarê melûl ê
sitûxwar pir êşiya û gelekî heyf û xebînetî xwe pê
hat. Lê pa ne hal lê mabû. ne reng û bezz lê
rawestiyabûn. ne jî çavên wî tiştê ji êkdu rind
mifsel dikirin. Tenê tiştê ku jê re mabû. hew
bawerî bû. Hîçji baweriya xwe danediket û pir bi
xwe dipesinî. Ha wisan ew qederekê li nava wî
bajarê xerîb geriya. geh bi aliyê rastê ve çû û gahî
li aliyê çepê fitilî. ta çend kuçe û kolan seredor
kirin. lê tiştê ji ya din nederanî.

Piştî li

maleke xirbende rast hat. ku dora wê tev dar û
hêşinayî bû. Hema xwe li deriyê hewşê xist û
derbasî hindur bû. Pêşî çeltikê firfiroka xwe bir
di binê dar û belgan de veşart û vegeriya çû liderî
xist. Bi terqereqa dêrî re. Pîrek hat derî lê vekir.
Lê pa çi pîr! Yeke zinzilî. porsipî. dirankelot
ku

herdu çavên wê di kûr de xewirî mane. Gava ew
çav pê ket. tirpînî ji serdila wî hilat û gelek jê
tirsiya.

Lê feyda tirsê
nebû.

riya revê jî pê

nediket ku ew şev bi şûnde vegere û bireviya. ne
jî dizanibû ka wê here kur.

- Dadê Pîrê. Hûn mêvanan nahewînir
- Lawê min. Ma xortê mîna te ku bi mêvantiya
min qayîl bibin. çewa ez nahewînim.

Fermo.

derbasbî hindur bibe. niha tu ji serman qefilîyî.
Gurgînî bi wê şerpezetiya bêhawe. hêdîka nigê
xwe di ser şêmûka dêrî re avêt aliyê din û derbasî

33

hindurê malê bû. Lê gava ku nerî, bila hundir bi
qurbana derva bibe, mala Pîrê maleke xir û xalî
ye, ne cilek heye ku li serê rûne û ne jî tişteki
xwarinê tê xuyakirin. Ew gelek jî birçî bûbû, pir
jî westiyabû û xewa wî bêqam dihat. Pêşî çavên
xwe li cilekê gerand ku li serê rûne, lê tişteki li
ber çavên wî neket. Ê xwe bi xwe ket nava pêlên
deryaya heyret û ramanan û fikirî ... De Gurgîn
kurê paşeyan e û di nava heyîyê de rabûye; tune-yî
çi ye nizan e, belengazî çilo ye bi ser ve nehatiye
û malên feqîran bi çi tewrî dimeşin, jixwe hîç
ber bi hişê wî ve nêz nebûye. Lê Pîra mazûrvanî
zû ew veciniqand:

- Kurê min. Tu zanî! Pîra te pir feqîr e, tişteki
xwarinê di mala min de nîne û livîneke zêde jî bo
raketina

mêvanan

tune.

Biborî, lawo. Fermo

xwe bide ser zilûkê.

Erê, ewgav Gurgîn bi wê gotina Pîrê ponijî,
hem jî ne hindik. Lê hindik bihurî carekê hema
li xwe varqilî ku kembera zêran li navtenga wî
girêdayî ye. Destê xwe avêt qolanê û ji pişta xwe
vekir, jê çend lib zêr derxistin û dane Pîrê:

- Dadê. De rabe here sûkê ji min û xwe re hin
xwarin bikirre, destek livîn jî ji min re bikirre û
zû werîne malê.

Gava Pîrê guh bi şingezingîniya zêrên zer ket,
bi kêf û şadî hema rabû ser nigan û şota xwe li
bota xwe xist, teşkên xwe liba kirin, zend û
bendên xwe li êk lefandin û ûçik li wan gerandin.

34

Ji kêfan re êdî paşiya xwe ha li vî dîwarî xist,
çend caran jî li dîwarê din xist û ji mêvanê xwe
re cih kire şotirmeydana colanê. Piştî rabû bi
bez û lez derket derve û berê xwe rast da sûkê. Ew
şev Pîrê têr û sertêra malê tiştên xwarinê kurrîn.
ji mêvanê şevê re jî destek livîn kurrî. hemû
xistin paytûnekê û rast anîne ber deriyê malê. Di
derengiya wê şevê de. nivê laşê berxikê kir
pîrzole û hinek jî kebab da bistê. digel cûreyên
texlîtan. texlîtên zebzeyên rengîn û tevî çend
nanên sêlê. li ser sifreyeke maqûl sererast kir.
Gurgîn û Pîrê hema çavên xwe girtin. devên xwe
vekirin û ketin serê. Lê ji leza Gurgînê bêtir Pîrê

gep û parî dixistin devê xwe û di nava qotikan de
diçûtin.

dicûtin.

lê fikir û nedikir nikaribû

daqurtîne. Li ser wê xwarina rengîr geh Pîrê tişt
ji Gurgînî pirsîn. gehahî Gurgînî jê tişt pirsîn û
gep ji gepê neqetandin. Hin caran jî gepên gir di
gewriya Pîrê de asê diman û bi tasa avê ew ber bi
xwarê ve dibezîyan.

Mêvan û mazûrvan hêj li ser wê sifra xwe ya
nişmî hemnişînê

xweşnişîn dibûn. terqînek ji

deriyê derve hat. Bi wê terqînê re tirpîn ji dilê

Gurgînî hilavêt û fikara hatina polîsên bajêr kir

ku ango bo wî hatine da ew şev wî bigrin. Lê belê

piştî nerî ku xortikekî di temenê wî de kete

hindurê malê û rast hat xêrhatin

dayê. piştî

got:

- Navê min Gêyo.

35

Gurgîn jî Lêvegerand û navê xwe gotê:

- Gurgîn.

Gêyo hêj li ser nigan bû, berê xwe da P"îrê:

- Dadê. Xwedê xêr bike! Ev gurek li kur miriye?

Çi qewimî ye, ev çi cîriyaye? Mêvanê te ji kur e.

ji kur ve tê, wê bi kur ve here?

- Lawo. Ka rûne pêşî xwarina xwe bixwe...

Gêyo jî 11

ser sifra xwarinê rûnişt û dev pê kir.

Piştî xwarinê îcar dor hate ser miştaxeya fêkî.

Pîrê sifreyeke wisan bi xax û xox ji fêkiyên

pirtex1îd jî sererast kir ku pê rengê nava malê

hate guhartin. Îcar hersê ketin serê de û lê

domandin. Piştî vekişandinê, Gêyo ji Gurgînî

pirsî:

- Bira. Tu wisan ji kur ve têtî. tu yê bi kur ve herî?

- Hema helal, hazir bibîne.

Axaftina

wan her wisa domand.

Lê hinek

bihurî,

berê axaftina wan kete ser karûbarên

jiyana dinyê û bi bez meşiya,

ber bi qal û bala

rewş û tevdira bajarê Kevîgolê û ya sazûmana wê

ve hate ajotin. Lê ew tewr û rewşa wan xaniyên

bajêr hîç ji hişê Gurgînê Paşê dernediçû.

- Birayê Gêyo. Xwedê hebîna, ev çima xaniyên

vî bajarê we halko bê rêkûpêk hatine lêkirin?

- Bira. Ji xwe re neke derd û bi derdan ve jî

mijûl nebe. Mala mirov bi derd û kederan diçe

Divê ku tu zêde li tiştan

mîratê.

nefikirî, lê

tiştan jî hîç jibîr mekî. Tu zanî, ev bajarê me yê

36

ku li keviya vê deryayê ye. niha

di destên

karbidestên biyanî de dinale. Îcar berî niha bi

çend salan berê. qewmekî biyanî ji aliyê

Rojhilatê ve hatibû mêvandariyê. Tu nabêjî xela

li wan rabûye û ji birçiyar tev reviyane. hatine

xwe avêtine hemêza bav û bapîran. Bav û kalên

me yê safik jî rabûne ew xwedî kirine. bi nan û

av û bi kinc û war kirine. Lê piştî wan lingê aşê

li me hildaye.

Pêşî keçên xwe dane serok û

serdarên me. Îcar her serokek û serdarek jî

rabûye pis û pism, mirov û xizmên jina xwe

xistiye kar û barên leşkerî. Ha wisan hinbihin

wan fersenda xwe dîtiye û dem hatiye bi derbekê

îdara welêt xistine destên xwe. Niha jî wan

zimên li me qedexe kiriye. tore û tewra me ji

holê rabirine û navên me. navên kevnewarên

war û deverên bav û bapîrên me guhartine bi

zimanên xwe. Li me û wan. wek mesela

ku

dibêjin: "Hat ji newalê. bû xwediyê malê" çêbûye.

Ew niha di welatê me de kêfa xwe dikin û

sefayeke xweş dimeşînin. Lê hîç rê û dirb bo kêf û

sefayê nadin me. Bi wê tenê jî ew nasekinin.
mafê jiyane jî nadin me. Çi kesê ji me ku ne
weke wan bilipike. pêre pêre stû lê difirikînin,
yên sax bimîne jî hema digirin û dikujin. yan
davêjin zîndanên bêbinî. Lê niha ji me hin kes
bûne alîgirên wan. Ha wele kula wan pir zor î
zehmet e û çî devera. çî qul û qewêreya ku ew
nizanibin jî. evên me ji wan re rêbertî dîkin û
37

dikevin pêşiya wan, ramî wan didin.

- Te got. derya?

- Erê. Hinek ji vê deryayê re gol jî dibêjin. Lê

xelkê herêmê

piranî ji navkirina

bi golê. pir

zivêr dibin.

Bêdengiyê dîsa konê xwe di nava xaniyê

jihevdaketî de vegirt û seriyên rakirî berjêr

nişivîn. her yekê di tangava xwe de hinzirî. Lê

xasma Gurgînî. hîç ji wan gotinan bawer

nedikir û nedixwest ku bawer jî bike. Erê. di dilê

xwe de got û biland: Hema derew û îcar jî

hewqas? Hey mala xwediyê derewan bişewite. Ev

xort çiqas dikare wisan delal û rind van derewan

li hevûdu bîne?

Ji aliyekî ve Gurgîn heqdar bû. Lewra wî heta

hingê tiştine

wisan bi xax ne dîtibûn,
ne jî
bihîztibûn. Ji ber hindê ew galegal jê re pir xerîb
dihatin xuyakirin û ji bawerkirina bi wan,
gelekî dûr diçerixî. Hem jî mîna ku ew hindî ji
wan galegalan tirsiyabe. Lê wî nizanibû ku tirsê
tîna xwe li mazûrvanên wî nehiştiye. her tişt li
wan rûniştandiye û xwe rewa daye pejirandin.
Di wê navê re. bala Pîrê kete ser Gurgînî. Wê
xwest ku hinekî pargavên mêvanê xwe bişidîne û
silikandina wî biftrikîne. da libekê bi xwe ve bê
û zêde nefikire. yan sêwra xirabiyeye nihênî ya
ku bi serve bê neke:

- Lawê min. Dibêjin ku zilamên çiyayî mêrxas
in. Mîna ku tu li deştiyan çûyî! Xwedê hebîna
38

diya le pısmama bavê te ye, yan deştı ye?

- Dapîr. Ne çaxê van pirsan e, jixwe ft>lekê
şiqama xwe li min xistiye
ez avê time biyanis-

ii

tanê. Eger ez bitirsım jî. ne tişteki bilome ü ga-
zindar e.

Ha wisa ew xeberdan hêj di devên wan de
digeriya ü dawî lê nehatibü,
terperepek

ji

dormedarê malê hate bihîztin, pê re jî deriyê
hindur vebû. De îcar çi bala xwe bidinê! Dîtin ku
çend polîs û leşker silava bêbextiyê dane wan û
dest pê kirin, li nava malê geriyan û her deverê
sehkirin. Lê pa çewa ü Çı tor sehkirina
hovane!

Hemü tiştên di nava malê de serobin kirin û ji
êkdu pirtikandin,
vejenandin
ü kirin pirtik û
parî. Piştire îcar bi milê Gurgîn û Gêyo girtin ti ew
herdu birin çüne barigeha leşkerî.
Erê, jixwe tenê ew yek ji mêvanê belengaz kê
mabû
ku bikirina.
Lê jixwe Pîrê! Ew bü fena
qepika
li ser
têjikan
ü hilperikî
nava
ser ü
guhên
wan; geh hêvî ü lavelav, gahî dijün ü
qirên, geh-geh jî girîn ü lorandin.
Lê ew gilî ü
gazin tu feyde nekirin ü çend pehîn li kêlekên wê
jî xistin. Piştire ew jî rabü ser nigan ü

li du

zaruyên xwe çû ber deriyê barîgehê. Dîsa bi şîn û girî dev bi nifir û afiran kir û ji serbazanên biyanî re dijûn barandin.

Lê her carê yek hate

der û wê da ber pehînan, ew ji ber derî dÛr kir.

Pîrê jî xwe li wir kire qîr û zivr û li wan daxwaza berdana herdu kurên xwe kir. Piştî lêdan û

39

şkence kirina li herdu xortikan a bi du rojan.

Pîrê çû xwe avête keyayê taxê, da here xwe bavêje serdaran û lawên wê bide berdan. Keyayê gewr hahakê rabû û bi lezeke qanîmanî çû ba serokê polîsan û bi "hêvî" hinek jî "bixatir" ew herdu dane berdan.

Heçika Gêyo bû, wî gelek caran dafikên wisa qetandibûn. Lê Gurgînê biyanî, heta wê demê jî tişteki wilo bi sosret nedîtibû û hîç nizanibû ku girtin, şkence û lêdan çine, bo çî li xortan dixin û ew diperpisînin. Tu nabêjî, leşker û polîsan Gurgînê pir êşandibûn. Wî xwe li ser nigan ranedigirt û kulîkulî bi rê ve diçû. Gava ku Pîrê li binê nigên wî nerî, dît ku herdu jî ji lêdana bi çoreş û şîn bûne, werimî ne û xwîna sor di binê çênn de qusiyaye, hin dever kêmkî ragirtine û pelqeqîşk dane, avzelêlk vegirtine. Lê piştî wî! jixwe sirta piştê ji lêdana bi copan teltêlî, tije

şivt û şax bûne û şûna wan reş-qermitî ye. Her
dever wisan,
defa singê, qalindiya ranên wî tev
ji şopa derban tê1têlî bûne. Û nalenala jê tê, xwe
li ser nigan ranagire, pirî û diêşe û nexweşekî
xedar î ha wilo giran.

Pîrê

nediwêriya

ku

Gurgînî

bibira

cem

bizişkekî

yan hekîmekî jî. Îcar wê sîravkek
çêkir, herdu nigên Gurgînî xistin navê de. Piştire
berxekê gurand û eyarê wê li piştta wî lefand. Ha
wisan ew du roj û sê şevan di nava eyêr de lefandî
ma. Hinbihin rih pê ve hat. xwîn lê seredor bû û
40

hindik reng u rû lê vebûn. Lê ne ew şkence. ne ji
hewqas lêdan ji bîra Gurgînî diçil1l û timi li xwe
û lî wan difikirî, gelek rîsêwirî ü pir jî diramiya,
xwe bi xwe digot. I: <-:z çewa karibim tola xwe ji
ê
van segbavan bistînim? [-<:z çilo bikim ku tola
ê
xwe dıbare bikim? Eger ew kiryara wan wilo bê

tolstendiî bimîne, ez ê ji derdan biteqim ü ew
kul dê bi min re heta devê gorê jî were. Lê hin
caran ber dilê xwe dida û digot: Mirov xwedîçik
in. Ew çîka ku di mirovan de heye, dikarin pê
çiyane mezin jî hilbiweşînin. Lê xwediye sebrê,
dibe ku bibe melîkê dewrê jî. Îcar ez ê jî niha
semax bikim, ka hetanî
ku ez çavnas
û rênas
bibim.

Pîrê Gurgînî hinek teselî kir, şîret Lê kirin,
bevzê wî xweş kir ü troşa wî rûbare gêrnind.
piştire gotê:

- Lawê min. Ev îş ha wisan bi serserkî nameşe.

Lewra eger mirov ji bo tolstendinê

amade be,

divê hêdî-hêdî,

bi zanîn û siyaset, bi xasüktî

ü

devxweş bimeşe. Teeew, kurê min! Te hêj tişteki
nedîtiye û nebînaye.

Eva ku te dît lêlê ye, ka

hetanî dora lolo bête ser me, ewçax em ê sosret ü

xaxên hêj girantir bibînin.

Çend roj di wê navê de bihurîn, êdî Gurgîn ger

hindik be jî hatibû ser kewna xwe ya berê. Erê

her çiqasî ew lêdan, ew şkence, ew birçîhiştin,

ew sixêf û dijûnên serbaz û polîsan hîç ji bîra

Gurgînî nediçûn jî, lê piştî wan gotin û galgalên
41

Pîrê. wî ew kêmasî ne dianî ser parsuyê xwe û pê
zêde nediponijî. Ponijandina herî zor î zehmet.
ew bû ku wî rîya tolstendinê nizanibû û timî Lê
difikirî.

Rojan êkdu rind dihingavtin. heftî û mehan ji
mêjû re dikirin rûpel û bi helebezê dibihurîn.
Gurgîn li wir hey şûna xwe. lê bê daxwaz xweş
dikir. Şevê ji nişka ve ew nixroyê nava bîr û
ramanan bû û mîna ku ji xwe çûbe. agehji hişê
xwe nema. Lê Pîrê zû ew veciniqand:

- Lawê min. Em tenê dizanin ku wan çî bi me
kiriye û çî nekiriye. Dîsanê rind çêbû. ew pê
nehisiyan ku tu ney ji virê yî. Eger ne wisan
biua. wê te bikuştina û termê te jî lime cûmûcela
bikirina. Lê tu sivik ji destên wan filitî. De kurê
min li pawuka Xwedê bihêle. Me derdê wan pir
dîtiye. Qey mîna ku razîbûna Xwedê jî bi vê atara
ku tê serê me heye!

Derdê giran ji Gurgînî re; ne wî dikaribû ku
xwe bi Pîrê û kurê wê bide naskirin.

ne jî

dizanibû ku wê bi kur ve here. Ew. hema ji xwe re
li wir ma û li pawuka çarenûsa xwe sekinî. Wî.
her çend rojan carekê du-sê lib zêr didan Pîrê. da
lêçûya malê bike. Ê digel kurê wê yekcaran

derdiket derve û herdu diçûn ji xwe re li nava
bajêr digeriyan. Heta êvarê diman û dîsa şûnde
vedigeriyane malê. şîva xwe dixwarin. Li dû şîvê.
Pîrê ji wan re çîrokek-didu digotin û piştê serî
dixistin xewa şêrîn û radizan.

42

Şevêkê hêj berî çaxê raketinê bû. Gêyo gote
Gurgîn:

- Bira. Madem tu kesê te nîne. hemaji xwe re li
vir be. Tu birayê min ê mezin

Pîrê jî diya me

û

herduyan.

- Spas.

Erê sipasiya

bêdil. mana bêdaxwaz. jiyana

netuhal û li welatê xerîb û xurbetstanê. Gurgînê

lawê Baroz Paşa, yê ku şêrînê ber dilê diya xwe

bû. delaliyê nava dilê bavê xwe bû, gula

bajarvaniyên bajarê Pêncşayê bû û evîna dilê

keç û zeriyan rengîn bû. êdî 11 bajarê nenas di

wî

mala Pîrê de ji xwe re mabû asê û bê kes û kilûs.

bê xizm û pismam hate dêrandin. Lê bêlome ye.

ew bi wê yekê pir 11ber xwe diket. gelekî fihêt

dikir.

zehf jî

şermîn
dibû.
Pa tişteki
ku
karibûna bike jî nebû, nemabû, ne dikaribû bi
azbatî xwe bi wan bida nasîn û ne jî dikaribû ku
xwe bi navê bavê xwe liwan eşkere bike. Erê. jê
re tu çareyên
din nemabûn,
deriyên
hemû
avayiyên lê hatibûne
radan. tenê bo wî tişteki
mabû: Semax. semax û dîsa jî semax!
Erê, semax! Lê eger pê re debar û tiroş, zanîn û
nasîn jî bibûna
hevalbend,
ewçax dê her tişt
hêsan dibûna û her derî jê re dihatine vekirin.
Bêguman e ku semaxkirin jî ne karê her kesî
ye. ne îşê her lawên bavan e û ne gula li destan.
bihna ber bêvilan e. Mirovê semaxkar. divê ku
bihneke dirêj. mîna ya gamêşan fireh lê hebe.
43

Divê ku dilên bihnfireyîyan ji deryaya Wanê û ji
ya Ormiyê kûrtir û firehtir bin. Divê ku zimanê
wan ji hingivê Berwariyê şêrîntir be û goştê laşê

wan ji poal hişktir be û xwuyê wan jî mîna yê milyaketên Yezdanê dilovan be. Lê mejiyê wan, divê ku wisan şixulkar û pêderxistkar be ku ji şeytên şeytantir bin û gelekî tîjîfem bin, ji periyên nazdar jî bêtir xwîynerm û kefidest bin. Ha Gurgînê Paşê diviya ku eynî wisan bûya. Eger na. wê rojekê hema bigotana tereq û ji hevûdu b1felişiya.

Roj li ber çavên Gurgînê dirêj dibûn, mehên wî dibûne sal û sal jî lê dibûne mîna sedsalan. Lê belê pê re zêr pir hebûn û xwar û vexwarin zah hebû. mala Pîrê bi saya kembera zêran kiribû weke kîlera şanikan. Êdî der û cîranên Pîrê. her kesî. ew bi "Kurê Pîrê" dinasiya û bi navê Gurgîn deng lê dikirin. Lê belê Gurgîn bi wê yekê her çendî ku pir diêşiya jî. lê çareyeke ku wî bikira nebû. Ji ber hindê seinax û tebat jê re bûbûn kela miradan û xwe pê ve radigirt. bi navê kurçirkê Pîrê lijiyana bi xerîbî didomand.

Ha bi wan teşqele û sergêjiyan, şevê Gurgîn di binê lihêfaxwe de pir fikirî û kûrekûr ramiya; ka mirov çewan dikare di nava xelkekî biyanî de bilipike û xwe têxe kiras û toreya wan. Lê wî rind jî dizanibû ku serê pêşî. jê re fêrbûna zimanê

44

wan pêwîst e. Piştî fêrbûna rabûn û runiştina wan digel naskirina tevger û têgihîştina bi tewr

û ber ve... Piştire jî naskirina çek û beran ... Îcar ew şev hema di cih de. wî biryara xwe da ku dê xwe fêrî zimanê deverê bike.

Sibehê zû gava Gurgîn ji xewê rabû û taştê xwarin. ji Pîrê hêvî kir ku ew wî bibe dibistanekê.

da zimên bixwîne. Pîrê jî nemerdî nekir. ew û kurê xwe Gêyo herdu rabûn wî birin û çûne dibistana taxê û navê wî li beşa şevê dane nivîsandin. Îcar ji wê rojê û pê ve Gurgînê dev pê kir her şev çû dibistanê û ~end. heta ku salek qediya. Mamosteyan dîplomayeke rindpuwan danê û ew di serkeftinê de jî pîroz kirin.

Êdî rê û dirbên hemû deveran li ber Gurgînê vedibûn. Hinbihin ew kete nava xelkê û têkilî germ kirin; riya rastî û zortya zordestan bi jar û belengazên bajêr da zanîn. ku divê mirov timî rastiye biparêze û li pey doza mafê xwe bikudîne. Eger ne wisan be. wê dîrok reşiyê li mirov bibarîne. hertim mirov tawanbar bike û atara roviyên ku herdu pê dikevin faqê bîne serê mirov. Bi wî hawayî. bi wê pêveçûn û pêvajoya rasterê. êdî hemû rê û kolan. her tişt ji Gurgînê re hêsan dihatine destpêkirin.

ew awa û tewrên

biyanistanê rind lê rûdiniştin. sebr û semax lê dadinihan û zêde jî guhên xwe nedidane wê bûyera ku bi serê wî ve hatibû.

Erê. dêmek gava ku mirov xwedîhêz bin. divê 45

ku di layê her tiştî de ji heqê xwe bêtin der û karibin gelşên xwe çareser bikin. Eger ne wisan be, kar nayête meşandin û bi gotina Yezdanê dilovan ku mirov ji çîyan mezintir hatine afirandin û pir xwedîhêz in, karin ji her hêzê re jî serdest werin. ji bîra xwe nedibir.

Her wisan xwe bi xwe timî digot ku jiyan jiyan e. her dever bej û zerya dinyayê ne û welatê biyanistanê jî eger hogirê mirov bibe. dibe mîna yê mirov. Lê ne dayika biyanî û ne jê bavê biyanî nabin yên mirov.

Piştî hingê dor hatibû ser kêf û geryanê. bûbû ya zewq û guzermanê û xwe li gorî tewr û torava deverê kaşerêz kir. Her roj piştî çaxê taştê. ew û Gêyo radibûn bi hev re diçun sûkê. heta êvarê li nava bajêr digeriyan. bihna kesî hindik hêsan dikirin û şûnde vedigeriyan dihatine malê. şîva xwe dixwarin, piştî şîvê jî Pîrê ji wan re çend çîrok. meselok û serpehatî ji dîrokê digotin û hêj serê xwe datanîn ser balgîv û radiketin.

Ha tevgera Gurgîn û Gêyo êdî her gera li nava bajêr bû. De çewan hebe. zêr di kembera Gurgînê

de hîn gelek mabûn û bi kêfa xwe xerc dikirin û
wî bajarê bindest wisa rind nasî ku jê re her kuçe
û kolan. mîna kefa destên wî dihatin dîtin.
êdî Gurgîn ji gera li nava bajêr
Lê hinbihin
zêv1r dibû. Diviya ku berê gera xwe biguhaztina û
naveroka
dîtina xwe cihêawe bikira. Û herdu
rabûn rast berê xwe dane aliyê deryaya Kevîgolê
46

çûn. Pêşî xwe tazî kirin û ketin avê, hinekî laşê
Û
xwe hênik kirin û piştê jî çûn bîstikekê xwe di
nava sîlê de gevizandin. Berêvarkî dîsa herdu
rabûn berê xwe dan riya malê û çûn.
Ketina avê li xweşê wan hatibû.
zêdetir li
xweşa Gurgînî çûbû. Lê jixwe girtina masiyan!
Ew, hîn zêdetir lê tîn fikir û wî dehf da bi bal
masîvaniyê ve. Herdu bira çûn dikanekê. Ji xwe
re du şewk kirrîn û dest bi girtina masiyan
kirin. Piştê îcar her roj sibe zû radibûn taştîya
xwe dixwarin û diçûn keviya avê. çengelên xwe
diavêtin kûrayîyê. Lê qismet! Wan jî nizanibû
ka dê karibin masiyan bigirin yanena.
Li hin deverên deryagolê masî pir hebûn.
li

hin deveran

hindik

û li hin deveran jî hîç

nebûn. Ew sedem, gelekî mejiyê Gurgînî têkel
dikir û dixwest ku bizanibe ka sedem çi ye. Lê
Gêyo jê re zû anî zimên, ku ava deryagolê ne
yekrû ye. Li hin deveran ava şor heye. Li hin
deveran ava şêrîn û li hin deveran jî ava sodayî
heye. Ha ji xwe li aliyê bakûrê
rojavayê wê.

sîleke mîna xwelîpişolkê hebû ku Ji wê ava
sodeyî çêbûye. Îcar heçîka masî ne, diyar e ku
kîjan ava ji wan re xweş be. wir ji xwe re dikin
wargeh û qada lêgerrê. Gêyo û Gurgîn ji wir
rabûn û ber bi aliyê başûrê rojavayê deryagolê
ve. kevî û kevî xwe berjêr xingrandin.

Li

deverekê Gurgîn çav bi giraveke pir nêzî keviyê
ket, ku mînaye nîvçiyayekî bilind. Li hawîdorê

47

gera wî mal li ser malan bi hevrazî ve hilkişane
û bergeyekî wisan xweş dide bînahiya çavan,
hema mirov Lêdiheyire. Lêmêzekirina wê bergê
pir li xweşa Gurgînî çû. Ew û Gêyo li tangava
Giravê sekinîn. Gêyo çîqên xwe hetanî çokê
hildan, çend gav bi nava avê ve çû, da karibe
şewka xwe dîr bavêje. Lê Gurgîn newêribû ku bi

kûrayiya avê ve here. Ji ber ku ew, lawikê çiyayî
bû. Her çiqasî çemê Qolincê di biniya bajarê bavê
wî re dibihurî jî, lê zêde neketibûyê û soberî jî
rind nizanibû. Hema ji xwe re li keviyê rûnişt û
nîçeke piçûçik ji hevîr kire gilomîtik û xist serê
çengelê xwe, ji bo qismetekî nepenî avête nava avê.

Herdu bira li wir her li girtina masiyan kudan-
din. Lê te dît, ji bo girtina masiyan jî dem divê,
zanîn û zîrektî pêwîst in û xasûktî jî ger pêre
nebe, ewçax keda mirov lihaş diçe.

Herdu li wirê hay ji xwe neman û masî girtin.

Ka çiqas dereng man an hindik, ha ku dîtin
boteke serbazî hat û li ber wan sekinî, ew ji wir
qewirandin. Sedem jî, ew Girava li pêşberê wan
ya ku lengerên xwe bera kûrayiya binê derygolê
dabûn bû û ku li serê koşkeke belek xwe rûqalî
çavan dikir. Hawîdorê koşkê bi çîçek û gulan, bi
sîsin, sosin û beybûnan ve tentêl dibû û bi tu
rengî destûra

nêzîkbûna

mirovan li keviya wê

rewa nedihate dîtin.

Tu nabêjî li Giravê, li hawîdorê wê koşkê bi şev û
rojan serbaz û polîsên dewletê notirvanî dikirin;

48

di destên wan de tivingên Birno xwe dîsandin û
nedihiştin qenim awirine xwar Lêbibin mêvan,

an çivîk jî di ser wê re bifirin.

Gurgîn û Gêyo li pêşberî wê fermana hovane
bêgav man û hêdikan rabûn, mîna ku ji rikê be
parestuya

xwe bixurînin

û qafûqurên

xwe

berhev kirin, dane rê û xatir ji avê xwestin. Lê ew
qewirandina bi dexzî gelekî rind Gurgînê biyanî
teyisand û li zora wî giran çû. Piştî demekê gava
bêdengiya kerr konê xwe daxist, hêdîka di ber
xwe de got:

- Bira. Bo çî ev serbaz wisanê em pîs kirin.

- Hê, hêê hêhl Wa baş e ku ji giravê berik bera
me nedan û em herdu jî nekuştin.

- Çima?

- Lê, ma tu nabînî kuwa koşkek liwê giravê ye.

- Erê, bila qe jî hebel

- Lê ... Ew serbaz,

koşka

keça Qiralê bajêr

diparêzin. Qiralê me, berî çend salan keça xwe

Feyruşayê bi darê zorê dabû kurê birayê xwe. Lê

keçikê Nîtoyê qamkurtik

nediva û xwe da kêra

ko. Bejna

Nîto, sê-çar

bihost

in. Yekî wisa

ye ku mirov qêmîş nake li serçavê wî

hintifokî

binere û dilê mirov jê dixele.

- Lê keçik?

- Keçik, hema tu dibêjî qey periyeye bihiştê ye

û daketiye dinyê, ji karxezalên

Çiyayê Sîpên jî

bedewtir e. Îcar Qiral rabû keça xwe sirgûnî wê

giravê kir û nahêle ku ji wir derkeve, hem jî

49

nahêle da çavên wê bi ruyê zilaman jî bikeve.

- Eêê?

- Êê! Niha hawîdorê koşkê tije serbaz û polîs

in. Ne kes dikare here wir, ne jî kes dikare ji wir

bê vî alî. Li gorî gotina gotinbêjan, ew Girav berê

girtîgeh bûye. Te dît, ku xaniyên lijêrê piçûk in û

di nava wan de hicirk hene. Îcar kîjan girtiyên

ku Qiral ji wan ditirsiya, ew dihinartine wir û

dixistine wan hicirkên teng. Lê wî girtîgeha

taybetî ji wir guhaztiye aliyê vî alî, ji bajêr dûr

çêkiriye û hawîdorê wê bi navê "Herêma Leşkerf'

navnîşan

kiriye.

- Kuro, wer mebêj!

- Erê wele.

Êdî deng û pêjn ji Gurgînî hew derketin, tenê li

êşa keça Qirêl û derdê wê fikirî. Lê hinbihin Gêyo
ew da xeberdanê
û xwest ku rind serpêhatiya
keçikê jê re bibêje, da rind bi meselê serwext
bibe. Lêbelê zû hat bîra wî ku Qiralê bajêr
axaftina
bi serpêhatiya
keça
xwe jî
daye
qedexekirin. Ji ber hindê Gêyo zimanê xwe gez
kir û zêde dirêj nekir.

*

Lê. gelo mirov çewa dikare tola xwe ji neyaran
hilîne? Yan dê bi çi riyê bike ku di tolgirtinê de
serkeftî bibe? Ha wisan di ber xwe de sêwirî ku dê
ew tola şkenceya xwe, bi gihandina
keça Qirêl

50

bistîne. Lê her çiqasî ew çavnas û rênas jî bûbû,
pa dîsan jî welat jê re biyanî dihate hesabandin.
De ka wê çewan bikaribûna
ku tola xwe
bistendina! Wî bi xwe jî ew yek ji xwe bawer
nedikir ku karibe di nava hewqas serbaz û
polîsan de xwe bigehîne keçikê û di wê yekê de
serkeftî bibe. Herdu gelek hêdî, hêdî û bi

rêveçûneke lengelûkî ya bi qanînamî çûn. Geh ji
xwe re rûniştin û bi hevûdu re peyivîn, behsa
keça Qirêl û koşka li giravê kirin. Gahî behsa
zordestî û çavsoriya Qirêl a li ser xelkê bajêr
kirin. Lê her çi be, diviya ku wan
berî tariya
şevêxwe
bigihandina
malê û şiv bixwarina,
piştire jî li çîrokên diya xwe ya pîr guhdarî
bikirina. Herdu çêleşêr bi tarîtiya şevê re gihane
ber dêriyê mala xwe. Bala xwe danê ku Pîrê liber
derî li pawuka wan xemgîn, xemgîn rûniştiye û
ew dipên. Pîrê ketibû tavUeke şeht û li ber deriyê
hewşê rûniştibû, destên xwe xistibûne binçengên
xwe û melûl,
melûl çavrêniya
hatina
herdu
lawên xwe dikir. Gava ew derbasî hindurê baxçe
û li ser sifra xwarinê
bûn, pêşî çûne hindur
rûniştin. Lê tu nabêjî, ew roj pirî ku herdu bira
westiyabûn û gelek jî ji bo qewirandina xwe ya ji
keviya avê zêvir bûbûn, xwe li xwe ranedigirtin.
şivê, li çîrokên
Hema piştî xwarina
Pîrê jî

guhdarî

nekirin û çûn ketin nava ciyên xwe,
raketin.

Gurgîn bîstikekê raket û ji nişka ve, mîna ku

51

keçek bangê wî dike ji xewa şêrîn veciniqî, hema
rabû ser nigan û li hawîdorê xwe meyizand. Lê wî
ne keçê dît û ne jî pêjna wê hilda. Careke din xwe
dirêj kir û lihêfê kişande ser serê xwe. Îcar xew Lê
herimî û di binê lihêfaxwe

de ket mabeyna

raman û xewnerojkan; ha bi vir de çû û sêwirî,

ha bi vir ve hat û ramiya, xwe di nava ciyan de

gevizand, bir û anî heta ku dîkên berdestî sibê li

wî û civata razayî ya xewxweşan xulxulandin.

Piştî banga dîkan rabû li ser ciyê xwe rûnişt, serê

xwe xist navbera herdu lepên xwe û ramiya.

Ew roj Gurgîn derneket deive. Berêvarkî rabû

çû nava baxçeyê li dora malê û bîstikekê bi tena

serê xwe gere dor kir, dîsanê

şûnde zivirî û çû

hindur,

xwe dirêj kir û hinekî xirmaş

bû. Di

xewna xwe de dît ku keçeke bedew hate cem û ew

hemêz kir, pê re kêf û henek kirin û di paşepaşê

de jî lê pêşniyara zewacê kir. Lêbelê te dît dibêjin

ku mirovê xenê ji bizavê jî dikeve, tirsonek e û ji her tiştê vediciniqe. Wî di xewna xwe de jî tiroş nekir ku bersîva keçikê bi erênê bide, yan çavên wî jê bibirrin ku pê re bibe hevalê xewê.

Xwedawo bêlome be, derdê evîna nepenî ji yê evîna penî pir zortir û zehmettir e. Lewra Gurgîn heta wê gavê jî ne keçikê dîtibû, ne ew di xewnên şevan de dîtibû û ne jî di zarûktiya xwe de bi êkdu re bûbûne hevalê leyiztikan. Lê nexwe ew bengîtî û evîna xewnokan bo çi lê rast dihat? Piştî ne madê wî vebû, ne xwarin dixwar, ne dikeniya û

52

hema serê wî di ber de. her û her difikirî. pir diramiya û ji bonê derd dixwarin. Bi wî hawayî bi wan sergêjîyan gelek roj bihurîn.

heftî

derbasbûn û saleke sax welê xwe pingar hUavêt.

Pîrê û kurê xwe jî pir li ber dilê wî diketin. ji

bona wî zahf diponijîn

û xemgîn dibûn.

Wan

dikir û nedikir. qenim Gurgîn birîna dilê xwe jî

bo wan venedikir. kula hinavan nedigot û ken.

kêf û henek herwekî li xwe qedexe kiribin

bêdeng dimeşiya. Ha wisan ew di nava agirê

evîneke bêbext de givişî mabû û pê diqijilî.

Pîrê gazî Gêyoyî kir:

- Kurê min. Ev lawik jî birayê te ye. Helbet derdekî wî yê nihênî heye ku wisan diponije. her dimihe û dihele. dizermihe. Ka rabe wî bibe devereke kêf û seyranê. da qenim ew hinekî xwe jibîr bike. Ê wî bi hinek xort û keçan bide naskirin.

Min hêvî Xwedê heye. belkî ew hinekî bi xwe ve bê û bevzê wî vebe. bedena wî geş bibe. Egerne. wê bi vî derdê nediyar rojekê di nava lepên me de here. Heyf e. kurê min.

Gêyo bi xebera diya xwe kir. rabû çû paytûnekê anî ber deriyê malê û Gurgînî lê siwar kir. ew rast bire Parka Azadiyê. Gava Gurgînî çav bi wê Parka xweş a hênik ket. ji gul û çîçekên wê re heyran

ma û bê hemdê xwe di binê lêvan de bişirî. Her ku çû. ew ji gulên rengareng re keniya û hinekî bevz lê vebû.

Parka .Azadiyê bi xweşikâtî û timtêla xwe ve.

53

nav

nîşan li parkên dinyayê tev lewitandibûn.

Ê

Wê, qadeke mezin dabû ber xwe û di navê de kemên gulan bi rêzê êkdu milbeste dihiştin, li dora wan çîçekên pirtexlît mîna qorên govendê

geremol dibûn. Di navbera wan de sîsin û sosin,
lale û binefş, nesrîn û yasemîn, jale û bûkik her
reqs û colana xwe betal nedikirin. Timî mîna ku
ew xêrhatin
didane serdaniyan
û çeperast
seriyên xwe dihejandin. Lê di ortê de çend
sêpiyên darpetûtî li ser nigan disekinîn û bi wan
ve şerêdên xilpoqkirî xwe nîşiv didan. Ew tewr û
berg pir bala Gurgînî kişandin ser xwe. Hêdîka
ber bi wan ve çû û ziloq ma ji xwe re li wan nerî.
Berî ew tiştêkî bipirse, Gêyo jê re dîroka Parkê
got ku berî çend salan li virê gelek serdar û
rêberên wan ji aliyê Qiralê xwînxwar ve hatine
xeniqandin. Piştî ku welêt bi temamî hatiye
vegirtin, îcar wî ev sêpî li vir hiştine. da xelk her
roj wan bibîne û ji wan saw bigre, bitirse da
qenim careke din kes troş neke ku serê xwe hilde
û daxwaza mafê xwe yê rewa bike.
Ew sêpiyên ku li parkê çikandî, bala Gurgînî
ne pir zêde kişandin, lê wan baweriyêke biteql jî
nexistin nava deftera rêznivîsa perwerdeyîyê. Ji
wî li welatê
ber
ku
xwe
êşa
bindestiyê

nekişandibû,
derdê sêpiyan nedîtibû
û rengê
kula
şerpezetiya
ji destên
serbazên
biyanî
nedizanî.
Erê wî bawer dikir ku ew sêpî hebe
li wir hatine
ne be dilq
in ku
çikandin
û
54

karbidestên
dewletê bi wan dilîn û hesa xelkê
xwe li pêşberî
aleciyan
diwerpixinin.
Piştî
qederekê. ew ji ber wan fet1efûtên bêgane yên li
navrasta çiçek û beybûnan hêdîka di ber xwe de
keniya û piştire jî:
∴ Ma hewqas jî dibe, ku xelkekî din bi mêvanî
bê welatê mirov û piştire îcar rabe vê atara giran

bi serê mirov ve bîne?
Gêyo di ber xwe de hînzirî. pir kûr û berwar çû
û di dilê xwe de sêwirand: Gava yek rastiya
axaftina mirov nepejirîne, divê bi hawayekî ku
ew têdigihe jê re bê pêşkêşkirin. Eger niha mirov
li welatekî
bêje ku li filan welatê
germiyan
serma di zivistanan de çem û kanî qeşem digrin.
tu bawerî ji wan re çênabe û mirov derewîn tê
hesibandin. Wek mesela ku leşker ji birçiyên
dimir. keça Qirêl digot: "Çima hûrikê birinê
naxwin?" li min û birakê min qewimîye. Ê de
baş e, hêdîka di ber xwe de dubare kir û lê
vegeriya:
- Erê! Dibe, bûye û niha jî dibe. Lê qey te jibîr
kiriye ku hewqasî serbazan ew şev li te dixistin
û şence
didan
laşê te. hewqas jî tu birçî
dihîştin?
Deng ji Gurgînî
derneket.
hema serê xwe
tewande ber xwe û hinekî ji Gêyo dûr çerixî, hem
jî xwe bi xwe sêwirî. Lê her ku çû, sêpiyên
çikandî di mejiyê wî de hin şeverê vekirin û çend
pirse şanî afirandin. bi hicirkan re ketin nava

nerastiyê. Gêyojî dûredûr lidû wî kişiya û

rastî

û

berê xwe bi aliyê sûkê ve dan. Herdu li sûkê
bêdeng û melûl geriyan. heta ku bû êvar û dîsa li
paytûnekê siwar bûn. rast berê xwe dan malê û
çûn.

Pîrê. ew şev ji zaruyên xwe re şîva êvarê helîsa
bacanê reş a bi sîr çêkiribû. Hinek jî seleta
bacanê sor digel pîvazên şîn. tevî çend nanên
sêlê danîne ser sifrê û herdu ketin serê xwarin.
Lê Gurginî gepek. didu avêtin devê xwe û şûnde
vekişiya. Jixwe dilê wî ew roj dagirtî bû. bi kul û
derdan tije bûbû. Helbet ji derdên giran bû. dibe
ku ji têngihîştina hin gotinan bû jî. Lê ne Pîrê
pê dizaniya û ne jî kurê wê pê dihisiya. Piştî
xwarinê.

her

yekê

wan

libek

ji

hirmiyên

hezîranî jî tûzî kirin û avêtin devê xwe. Îcar dor
gîhabû ser gotina çîrokan. Pîrê dev pê kir û ji
wan re şeva kerr a lal. kire qada şênîtiya çand û

vêjeya dibistaneke zêrîn:

Hebû tunebû.

Dibêjin ji Xwedê mezintir

kesek tun bû. Mezinê dijminan qotikê serê me bû. Mezinên me jî tev di girtîgeh û zîندان de dîlbeste bûn. Hema carek ji caran. rihmet li dê û bavên hazir û guhdaran.

reşî bibare li cendirme

û tahsîldaran.

xweşî jî bibare li me û guhdaran.

Dibêjin gava Berhîmê lawê Azerî hêj zarûk bû.

carekê Nemrûdî ew dîtiye û ziloq li nava çavên

wî meyîzandiye. Piştî xwe bi xwe gotiye

- Ez ji çavên vî gedeyî ditirsim. Eger ne bixêr

56

gava ev mezin bibe, wê keywantiya min wêran bike, seraya min hilbiweşîne û sazûmana min ji holê rabike. Îcar divê ku ez nehêlim da ev lawik mezin bibe.

Ha virde, ha wirde de ev law ê kê ye, ne ê kê ye, pirs û pirs, hinekan gotiye:

- Ev, lawê mam. Azei ye.

- Ka herin gazî mam .Azerbikin, bila bête vir.

Mam .Azergava ku çûye cem Nemrûd, Nemrûdî gotiyê:

- Ez bala xwe didim lawikê te, mîna ku pir çê ye. Tu vî lawikî nadî min?

- Ka ez ê bi diya wî jî bişêwirim.

Azer ji ba Nemrûdî rabûye û bi çavine giryende
çûye ba jina xwe. meselê gotiyê. ku ne ji xêrê re
ye Nemrûd wisan dibêje. Helbet wê kurê min
bikuje. Ekene, bi hezaran law mîna yê min hene.
Çima yekî din naxwaze?

.Azer û jina xwe biryar dane ku lawê xwe ji ber
Nemrûdî veşêrin. Lê hema li kur û di kur de?
şkeft eke li çiyayê

Piştire

wî birine

xistine

Nemrûd. Îcar Berhîmê tîfal dest bi jiyana çolan
kiriye,

birçî maye û bi hirç û koviyan re bûye

cîran û heval.

Êdî sal û zeman derbas dibin. Berhîm mezin

dibe û di şkeftê de jî dizewice. Rojekê ew

derdikeve serê Çiyê û ji xwe re li dinyayê temaşe

ku wa li jora

dike. Dibîne

Çiyê gelek bû te

(Heykel) hene û her yekê wan qursikek li ber e.

57

Ew li wan şaş maye û fikiriye: ma bûte jî nan

dixwin? Hêdîka û bi tirs çûye li ber bûteyekî

sekiniye û pê re peyiviye. Lê deng jê derneketiye.

Piştire çûye li ba yekî din sekiniye û pê re
peyiviye. deng ji wî jî derneketiye. Hema ew
bivirê xwe li wan dixê. dibêje "De nanên xwe
bixwin" û ew bûte hemû şikandine.

Piştî du-sê rojan xebera şikandina bû teyan
gihaye guhên Nemrûdî. Nemrûd gelekî pê zêvir
bûye û ferman daye. da her kes were cem wî û
bibêje. ka kê ew bûte şikandine. Her kes çeye cem
û ew daye bawerkirin ku ne ewî ew tişt kiriye. Lê
gava ku dibîne wa Berhîmê lawê mam Azerî
nehat balê. dipirse:

- Ka lawê mam Azerî li kû ye îro?

Fesadek dibêje:

- Ya xwedanê şev û rojan. Ma tu nizanî ku ew û
bavê xwe. te bi xwedatî napejirînin? Erê. hebe
tune be. Berhîmoko

ew bûteyên

dilovan

şikandine.

Nemrûd radibe fermana kuştina Berhîmê dide.

Îcar serbaz û serkar digel polîs û parêzvanên
taybetî hemû derdikevit lêgerîna wî. Lê Berhîm
zû pê dihise. ew û jina xwe bi destên hev digirin û
ber bi Berîstana Silekanê ve mişext dibin. Diçin.
diçin û her ber bi başûrê ve dibezin.

Bi rê ve jina Berhîmê diwelide. Xwedê kurekî
didê û navê wî datînin Smayil.

Li wir radibin

Smayilokê xwe di nava pot û pelatan de dipêçin û
58

dîsa li riya xwe didomînin, diçin heta ku digîjin
nêzî Çiyayê Herefê. Ew pirî ku westiyane, êdî weş
li wan nameye. Li quntarê rûdinin da bihna xwe
berdin û çavên xwe li avê digerînin. Lê ha vir de
diçin ha wir ve diçin û tîn, av tune. Carekê hema
lemelema avê dibihîzin û ber pê ve diçin. Diçin,
dibînin. pirî ku Smayîlokê wan giriyaye û nigên
xwe li erdê xistine. erd kort bûye û tê re aveke
boş avêtiye, hem jî bi zimezim û hingeding
diherike. Kêfa Berhîm û ya jina wî pir tê û li ser
wê kaniyê xaniyekî avadikin, navê wê datînin
"Cîgeha Smayîl" û tê de rûdinin. Piştê bi demekê
ew kanî dimiçiqe. Lê vêca Berhîm radibe û şûna
wê dikole, weke bîrê kûr dike heta ku digije avê.
Piştê navê wê bîrê jî datînin "Bîra Zimzimê" û ji
bazirganiya Berîstanê re dikin wargeha êminatî
û bigaviyê ...

Gurginî her di dilê xwe de digot "Pîrê de hiş be,
nema ez li te guhdarî dikim"

êdî bes e heyran,

lêbelê pa de Pîrê carek hîn bûbû û bê gotina
çirokan tebata wê nedihat. Eger wê şevê tenê jî
çîrok negotina, mîna ku sipî ketibin kirasê wê
dixuriya. Eger hin kesên hazir ku lê guhdarî
bikirna tune bûn jî, evca wê berê xwe dida pisêka

xwe û jê re çîrok digot, heta ku dihênijî û diçû
dikete nava ciyê xwe, radiket.

Wê hingê hey ku Pîrê çîroka xwe digot jî, lê
ser koşka li

Gurgînî hiş û rama xwe berdabû

giravê û evîna keça girêl di dilê xwe de bi şax û

59

per dikirin. Piştî wî bi hiceta xewê xwest ku zû
fanosê vemirînin, têkevîne nava ciyên xwe û
rakevin. Lê Gêyo û diya xwe ji ber bêmadebûna
wî ne hindik dihizirîn, li ber dilê wî diketin û pir
diêşyan. Her qasê carekê Gurgînî mîna ku di
xew re biçe serê xwe leq dikir, xirexir ji qirika
xwe derxist û dimelisand. Lê ew şev ne xewa Pîrê
dihat û ne jî ya kurê wê. Piştî gava P'îrê bala xwe
dayê ku tewş e, dengê çîroka wê dikeve guhên
mişkan û nakeve guhên Gurgînî, hêdîka rabû bi
milekî wî girt û ew bire ser ciyê wî, da ji xwe re
rakeve. Piştî Gêyo û diya xwe jî, her yekê wan
ber bi ciyê xwe ve çû û bêdengiya qal hindurê
malê ji xezeba xwe dagirt.

Gurgîn xwe li xewê melisand û di ber xwe de
hêdîkan kire xirexir. Lê guhên wî hey li ser Pîrê
bû, ka ji oda wê xirexir tê yan na. Erê piştî ku
bihîzt wa xirexir pê ket, hêdîka ew jî kete nava
deryaya raman û xweziyan û ji nava ciyê xwe
rabû, çû derve û firfiroka xwe ji nava dar û beran

derxist, per û baskên wê lê saz kirin û siwar bibe,
bi firekê çû li ser banê wê koşka li giravê danişî.
Erê Gurgînî di nava deryaya wê rêwîtiyê de,
ftrfirokê di cih de hişt û bêpêjn xwe di derencokê
re bera xwarê da, çû dertyê oda ku keça Qirêl tê de
raketî bû vekir. Pa îcar çî bibîne!

Dît ku wa

keçik li ser textekî zêrîn raketiye û temeziyeke
zer li ser ruyê wê ye. Firaqek tije xwarin jî li ser
li ser masê ye, kevçiyekî zêrîn li
bergeşeka

60

kêlekê ye û sewîlekî zîvîn ê tije Ji ava Kewserê ku
sêveke sor a Xelatê Jî di dev de li berê disekine.
Gurgîn geh li sêvê nerî, geh li keçikê meyizand.
geh- bala xwe da xwarinê. gahî Jî awir dane
serçavên belek ên ku di binê temezitê de
dîsiyan. Pa keç û hema Jî keç! Hîîw! Di ber xwe
de hêdîka nûziya û dîsa lê domand: Keçên wisa
delal î nazenîn Jî li darê dinyayê hene. gelo? Erê.
helbet hene. ha va ev e yek li vir e! Lê ka ew
gurçika polayî ku bilbilê xemgîn karibe xwe
bavêje ser wê gula rengîn? Na. ev zerî naşûfe
mirovan. Ne dişûfe tixmê mirovan û ne Jî av û axa
wê Ji ya wan çêbûye. Hebe tune be. ev keç wêneyekî
xeyalî ye ku di xeyala biyanî de hêşîn dibe.
Tu nabêjî ew şev pirî ku derd û kulên giran xwe

bera ser qulçikên dilê Feyrûşayê Jî dane, dilê wê
nebijiye xwarinê û dev li şîva êvarê nedaye.
Hema xwe bi xwe fikiriye. gelek ramiyaye û
hewqas zêde sêwiriye ta ku ji ber êşa dilê
birîndar xayîs bûye û piştî hema çûye xwe li ser
têxt dirêj kiriye. di xewa ramanan re nixro bûye.
Ew du roj bihurîbûn
ku Gurgînî
xwarin
nexwaribû.
Dilê wî Ji birçiyar
dixeliya. gelek
digiviştî û elqên vereşanê dihatinê. Pêşî ku tîmê
xwe yê ramanî li xwarinê xirab kir. li ava sêwîl
û sêvê ku bixwe û vexwe. hêj diviya wî şerbeta lêv
û hinaran vexwarina.
Erê zikê birçî êdî ne vala bû, hem Jî bi qîmê
dagirtibû
û têr av Jî vexwaribû.
Îcar Jê re dor
61

hatibû ser têkirina dilê dîbrçî û lêvên qermeçî.
Lê ka bi çi xwarin û vexwarinê? Ka Çicûre libat û
bizav? Erê, hema delalî û êdî hewqas jî! Hey
malxirabê, bêbavê, kê ew reng û rê li te wisan
bêkêmasî werandibûn ku di xewn û ramanan de
jî lawikê biyanî ji bo te xwe avêtibû ser riya

mirin û nemanê? Wî hîç nizanibû ku pesn û
wesyetên delaliya delalan bidana û behsa
rindiya rindê bikira. Jixwe birçiyê dilxemgîn ji
rindê re heyran dima û şaş mabû ku çi bike: ne
karibû here tewafê û ne jî karibû bi şûnde vekişe
here malê. Hema ziloq bû û li serçavên di binê
temeziya zer de nerî. Ew delalî, ew şanazî, ew
beybûnî, ew gewretî û bedewiya lê, hemû nexş û
nimûşên Manî diavêtin mazata mirîşkan. Ne jî
li dinyayê zerî û perî dikaribûn
pê re hembertî
bikin û ne bi helbestên Teyranî, ne xamekêşiya
Cizîranî, ne jî nijadxweşiya
Xanî ku bi
reşbelekiyan ve dilê miriyan jî jîndar dihêlin,
ne jî qelema Axtepiyê bengî
karibûn
kêl û
kêlsima bedewê têxine sindoqa rastnivîsê û ser û
sînc lê xweş bikin. Wey bavo, li min birawo, êdî
hewqas jî? Herê ka bêje, bi çi destûrê
tu ji
mirovan
fiştîqiye
û
bi
havênê
axîn

hatî

meyandin? Na, ev yek ne rast e û ji bin ve jî
derewe, ku ev delalî karibe ji nava hewqas xwîn
û xwîdana kesan xwe di nava per û baskên
gewretiyê

re

bidehfîne

û

ber

bi jiyaneke

teşqeledar

ve were holê. Niha roj û hîv pir

62

gunehkar

in ku mafê jîndaran

bi darê zorê bo

xwe wergirtine, yan hêzekê ew maf daye wan. kî
çi dizane! Lê Gurgînî hin caran ew xewn û
ramana xwe dişûfande roja di navbera kesk û
sora Alaya pîroz de. hin caran jî wê bi rengê
xwîna şehîdên nemir rengdêr fikir. Ê li ber ruyê
wê bû mîna pepûk û evdalan. Jixwe gava ku
temezî bi hilma wê re bilind dibû û dadiket, jê
weye ku ew di zikrê Yezdanê dilovan de
reqsebazyan dike û li bihişta berîn bi horiyan
re ketiye cergebazê. hema pêre pêre dilê wî di
şûna xwe de dest bi govenda sêpê kir û reqisî. Lê

belê çewa ku diyar e derdê birçîbûnê
nayê
bipaşvedan
û nerihetiyeke
zor dadixîne nava
hicirkên mixê ganî. Erê. ne lihaş jî gotine ku
kêfa miriyan tê lê ya birçiyar nayê.
Gurgîn. hinekî çûna bo serdana bihişta Laleşî
dereng xist û vegeriya çû rahişt kevçî. kete ser
şîva êvarê, nêvî jê xwar. Piştî hinek ji ava
sêwîlê kewserî jî vexwar û sêva sor a Xelatî kir
du qeşt. Qeştekan jê xwar û ya din dîsa xist devê
sêwîlê. Piştî hêdîka ber bi textê pîroz ve beziya.
çû bi herdu guşan girt û temeziya bimbarek ji ser
ruyê qal ê lewend rakir. Lê gava kir kû devê xwe
bigehîne şanikê, tirsî şenceya şeva dîlmanê ew
hingavt û laşê wî lerizî, hinek rihilî û piştî jî
gelek ricifi. Lê belê wek mesela ku dibêjin: Gava
talih û firset werin ber deriyê mirovatîyê. jê re
dana muhletê
heram
e, pir û pir heram
e.
63

gunehkariyeke
mezin e û tu cara jî nayête
lêborandin. Piştî ku ew libîrhatin xwe nîşanê

gurçikan da. di wê hingamê de bizaveke çiyayî jî
xwe bera ser dil û gurçikên wî dan û bi şîranî
devê xwe xist gurçika ruyê rastê. çend caran lê
mij iya. Belam herdu çavên keçika nazenîn, bi
xewê re hevalbend bûn. Lê gava bi kişandina
hinaroka xwe hisiya. guman kir ku mêşek wê gez
dike. Hêdîka destekî xwe leqand û ango mêşê da
firandin. dîsa li xewa xwe domand. Gurgîn Jî
berê xewna xwe vegerande ser banê koşkê. li riya
xwe şûnde vegeheriya û bi firfiroka xwe çû li nava
baxçê mala Pîrê danî. F1rfirokê Ji hev daxist, per
û baskên wê dîsa xistin çeltik û bir ew di şûna
berê de veşart. derbasî hindurê sar û cemidî bû.
çû kete nava ciyê xwe û raket.

Lê pa êdî qey xew dihate çavên wî. Na herêl Ne
xewa Gurgînî dihat û ne Jî ew Ji nêçîra şevê têr
bûbû. De her çi be. diviya ku ew Ji westandina
rêwîtiya şevê hêsan bimana û ne Pîrê. ne Jî kurê
wê pê bihisiyana. Ew şev wî xwe bi xweziyan têr
dikiri. dilê xwe Jî her wisan têr dagirtibû. Lê ew
şîraniya lêvan. a hinarokê hêj bi lêvên wî ve bûn
û hem Jî ketibûne nava qulikên dindanan.

Her

carê qasekî di nava ciyan de dikir mirçemirç.
dev û lêvên xwe li hev dixistin. hawîdorê devê
xwe dadilast.

mîna ku hêj ew li gurçika ruyê
bedewê dimije wisa bi misandineke

vala xwe di
xewê re bir.

64

Pîrê hema carekê ji xewa xwe veciniqî. Guhên xwe tapêl kirin. bala xwe dayê ku şemateyek ji aliyê ciyê Gurgînî ve tê. Lê wê dizaniya ku ew ji ber êş û derdên ku di xewê de jî lê dibin bela wisan dinale. yan ji pesnan dipeyive ku wisan xirepişk dike. Gelekî dilê wê jê re êşiya û xwe bi xwe got: Xerîbî pir zor e. gelek jî zehmet e. Ez nizamim gelo ev lawik ji kur ejî. Ekene min ê cabekê bişeyandina ji dê û bavê wî re. yan xizmek û pismamekî wî re ger hebûna. da bi telbe ve werin. De haaihah. ew ji min re nabêje jî ku ji kur e. Gelo ez ê çewan bikim? Xwedawo. tu deriyekî xêrê vekî! Pîrê êdî li xewa xwe nebû mêvan. qasekî xwe di binê lihêfê de gemirrand û piştire rabû ava şorba sibê danî ser kuçikî. Dîzik bi kel kett. nîskên xwe pê dakirin. li ber Ufikê rûnişt û destekî da ber ruyê xwe. hin caran jî xwe bi bistikê mijûl kir. êgir tevda û li çarenûsa Gurgînî sêwirî.

Ew roj sibehê Gurgîn di çaxê her roj de şiyar nebû ku rabe taştê bixwe. Gêyo çû da wî şiyar bike. Lê Pîrê nehişt:

- Lêwik. îşev heta berdestî sibehê şiyar maye.

Jê biqer. kurê min bila hinekî din jî lêwik ji xwe
re rakeve.

*

65

Tu nabêjî. ew roj Feyrûşaya
dildagirtî ya ji kul
û derdanjîji kesera dilê xwe re her mîna Gurgînê
Paşê di çaxê her roj de ji xewa xwe şiyar nebûbû û
hetanî bejnek. du bejnan roj hilkişiya jî. di binê
lihêfê de raketî mabû. Lê dema Serayîya qerwaşa
wê jê re taştiya sibê anî. ew bi teqîna deriyê xwe
hisiya û rabû pê. kincên melesî li bejna xwe
kirin û çû serçavê xwe
şûşt. Îcar livegerê gava wê
bala xwe da xwarina
xwe ya êvarê. dît ku jê
hatiye xwarin û sêva
di devê sêwîl de jî qeşt e.
Rahişt sêwîl. neii ku ji
ava tê de jî kêmbûye. Xwe
bi xwe fikirî. gelo kê weha kiriye. kê nekiriye?
Hebe tune
be. Qerwaşê
ev tişt kiriye! Piştî
hêrsbÛlleke zêde. bi dengê berz gazî Qerwaşê kir:
- Heyla kezîkurra kemkurr. Hey weke min bê
mirad mayê. Ne. xwarina min ji ber destên te tê.

Ma tu lijêrê têr naxwî ku tu îşev hatî jorê û te şîva min a êvarê jî xwariye?
Qerwaş bi wê gotinê di şûna xwe sar bû. cemidî.
rih lê nema û destekî xwe da ber devê xwe. hêdîka di ber xwe de got: Weyla limin û vê ecêbê! De îcar ev ji min kê mabû! Ê ziloq bû li nava çavên xatûna xwe neii. Ewçax çawên wê ketin ser deqa reş a di ruyê Feyrûşayê de ku ji mijandina şevê çêbûbû û hema ziloq bû lê neii. Piştire bû tlqetiqa Qerwaşê. bîstikekê xwe bi xwe keniya û piştire got:
- Xatûna min. Bi serê bavê te. ne min nexwariye. Lê. ew çi gursa reş e ku liruyê te çêbûye?
66

Bi gotina "qursa reş" re, herwekî ku cêrek ava sar bi Feyrûşayê ve bête rijandin wisan ji xwe re ma şe mirî û di şûna xwe de sar bû, cemidî.
Bîstikekê şûnde hema berê xwe da neynikê û çû lixwe nerî. Îcar gava wê bi çavên xwe jî ew qursa reş a di ruyê xwe de dît, pêre pêre daket nava tavila tirsê û gumana hatina xirabiyên ku bêne serê wê kirin. Erê pa qey hema qurs bû! Ev kê wilo kiriye, weyla li min kezîkurrê, kê nekiriye!
Xwe bi xwe got û piştire dîsa: Hahooo! Weyla li min hêsîra dertûlan, li min pepûka li ber deriyan. Îcar ev ji min kê mabû, heeh? De ka wê kî ji min bawer bike ku ne yekî gez kiriye? Ê de baş e, gotine: "Xwediyêsebrê melikê Misrê." Ez

ê jî hetanî êvarê sebr û semax bikim. Dêmek ev zilamek e îşev hatiye ser ciyê min û xwarina min xwariye. ava min vexwariye. qeşteki ji sêva min xwariye û di ser de tew ruyê min Jî maçî kiriye û segbav hêj çûye. Ê de baş e. Ewê ku îşev hatiye, helbet wê şeveke din jî bê. Îşeva bê, ez Ez ê li wî bibim ranakevin.

notirvan.

ka

binerim kî ye! Belkî serbazek be. yan polîsek be jî. Lê heke yek ji wan bûna, nexwe çima heta niha xwe li min eşkere nedikir?

Feryûşayê li wir kete nava gerrîneka firatên fihêtî û şermezariyên giran, tê de nixro bû û geh derkete ser rû, hin caran dakete binî û geh hilkişiya Jorê. Hem jî li zilamê rûramûsandî sêwrî û gelekî li ber xwe ket, bi ser hevdu ve çû û

67

givişî, ponijî

berê xwe da Qeıwaşê, bi zarîneke

û

melûl, bi axaftineke pe1tek a kelogirî û bi lêvine ricfokî got:

- Ez hêvî ji te dikim, tu vê yekê ji kesî re behs nekî. Jixwe carekê min bavê xwe şikandiye. Îcar eger ew pê bihise, wê bêje: "Dêmek yarekî wê

hebû, lewra ku biraziyê min nekir! Ewçav dê min sosretnemayî bike û berde dinyê.

- Na, na! Xatûna min, tu ji min firîqet be, eger devê min tije xwîn be jî, ez 11ber kesî narijînim erdê.

Feyrûşayê bi qerwaşa xwe Serayî ne hewqasa bi bawer bû û jê gumana ku ew dê mesela qursa di ruyê wê de ji xelkê re bêje dikir. Lê mesela ku "Çav ji çavan şerm dike, bertîl jî keviran nerm dike" hate

bîra

wê. Îcar diviya ku ji xeynî

şermkirina ji çavan, ew wê bertîl jî bikira. Hema qolana xwe ya zêran ji sindoqê derxist û xiste stuyê Qerwaşê û dîsa pê ve ket hêvî û zartyan, da ji kesî re behsa reşayiya di ruyê wê de meke.

Qerwaş bi dilekî şad berjêr bû û çû xwarê.

Feyrûşayê jî bi dilekî şikestî yê neseqirî çû kete nava ciyên xwe û hetanî

êvarê ji binê 11hêfê

derneket.

Nîvro gava firavîna wê hat, ranebû

devê xwe pê nekir. Êvarê şîva wê anîn, dîsa ranebû û nexwar.

Hema di binê lihêfê de li

zîlamê rûramûsandî

fikirî û ramiya. Lê tîna wan

fîkr û ramanan

nehişt ku zêde ew 11hişê xwe
bimîne û berî çaxê razanê çavên wê melisîn,
68

dewxa wê hat û xayis bû.

Devê Gurgînê Paşê tije peyv bûn. dilê wî tye
xem û derd bûn, Lêji tirsax hin bela û siqûmatan
nediwêriya ku libekê ji wan birêje erdê. Erê her
çiqasî Pîrê mîna diya wî ya şîrhelal bû û Gêyo jî
jê re weke birayekî ji dê û bavekî bû. lê eger wî
nekira hisêban dê bidîtina gelek ecêban. Kî çî
dizane ku çî dibe û çî nabe. Lewra welat. jê re
welatekî biyanî bû. Ew axa ku li serê. jê re axeke
nenas bû. Dost û nasên heyî yên li wir jî. ne ji
xwîn û azbatê bûn û rind ewleyiya xwe bi wan
nedihanî. Lewra dibû ku hema necamêrek. an jî
casûsekî girêl ew yekjê bibihîztina. Ewçax kî çî
dizane ku wê çî bihatina serê lêwik?

De bila Gurgîn nekişîne

derdan.

da bibîne

gelek xweşiya

rindan.

Wî hemû

nihênî

û

taybetmendiyeên xwe xistin nava sindoqa di nîvê

dilê şikestî de û derî lê rada. Danê nîvro. ew û
Gêyo dîsa rabûn çûn li nava bajêr geriyan. heta
ku bû êvar û dîsanê şûnde vegeriyane malê. Piştî
şîvê şewbêrka xwe bihartin û ketin nava livînên
xwe da rakevin. Bîstikek di wê navê re bihurî.
Pîrê û kurê xwe dev bi xirexirê kirin û li xewê
danişîn. Gurgîn jî hêdîka rabû kincên xwe lixwe
kirin û xwe bera nêv meyana deryaya xewn û
ramanan da. bi kûrayîyê ve daket; geh avjenî kir
69

panî kutan.

geh rêveçûn kir û nig lezandin.

Û

gahî jî bi fira firfirokê leziya û pîlik badan. Ha
ku dît. wa li ser banê koşka keça Qirêl danişîye.
Wek şeva berê dîsa xwe di derencokê re bera
xwarê da û çû deriyê oda keçikê vekir. nerî ku
dîsanê ew di xew de ye û şîva wê. sewîlê avê yê sêv
di dev de jî liser masê ne.

Erê. Gurgîn vê carê ne birçî zik bû. ne jî tihnê
avê bû. Lê dilê wî pir birçî bû. hem jî birçiyê
lêvan bû. birçiyê şerbeta gewran bû û dixwest ku
careke din lêvên xwe bi ava kaniya Laleşî seretêr
bike û dîsa bêpêjn şûnde vegere mala Pîrê. Lê ew
ji bo bi keçikê bide zanîn ku evê tê oda wê. ne ji
kesên ji me çêtir e. vê carê wî tenê kevçiyekî ji
xwarina

wê xwar.

qurçek ji ava di sêwil de

vexwar û sêvê jî kire qeşt. qeşteki xwar û qeşt
din dîsa xist şûnê. Piştî hêdî. hêdî çû liber textê
keywaniyetê sekinî û bi rêzanî temeziya kesk ji
ser ruyê wê yê ferfûrî rakir. Vê carê wî devera
tewafê guhart. devê xwe xist gurçika ruyê çepê û
çend caran lê mij iya. Piştî hêdîka temeziyê
daxiste ser bejayîya pîroz û ji devera giranbiha
şûn de vekîşiya. çû ser bîn. Weke berê dîsa kete
ser pişka jiyane û firiya. ha ku dît wa ye ku ew li
nava baxçeyê Pîrê diheje û silava xwe gihande
kema gulê. Piştî ku fîroka xwe ji hev daxist û
di ciyê wê de veşart.

bêpêjn derbasî hindur bû û

çû kete nava ciyê xwe. raket.

*

70

Hêj dîkên raketî dev bi banga xwe ya berdestî
sibehê nekiribûn, Feyruşayê bi tirs ji xewa şêrîn
veciniqî. Erê bitirs! Lê tirseke çewa! Laşê wê
dirihilî, lêvên wê diricifin, destên wê dilerizîn û
kutekuta nava dilê wê diçû heta ku milyaketên li
asîmanê bilind jî guhên xwe ji berê xitimandin.
Hêdîka rabû li hawîdor nerî, dît ku wa ji xewê
li
radibe, îcar hêj bêtir fûraniya

dilê kederbar

xwe zêdetir bar ragirt û pijaqên hêrsê ew serobin
gêrandin. Lê dema çav bi şîva xwe ya êvarê ket.
dît ku wa şûna kevçiyekî vala di xwarina wê de
kort bûye, pirtînî ji serdila wê hilat û çû rahişte
sewîlê xwe hejand. Erê ji teqla wî deranî ku ji
ava wî jî kêmbûye û qeşteke ji sêva di dev de jî
tune. Wê hingê ew qursa reş a roja berê ku ketibû
ruyê wê hat bîrê û hema bi bez çû ber neynikê, li
xwe nerî, dît ku ev şev qurseke reş îcar ketiye
ruyê wê yê çepê. Xwe bi xwe got: Haylooo! Malikê
tu xirab î, çewa ku îşev jî wa xirab bûye. Vê carê
tixayê lawê kûçikan qurseke reş îcar xistiye
ruyê min ê çepê! De îcar ez ê çewa bikim,
haaiihah!

Û fikirî, ramiya, piştî jî got: Lê evê
ku tê û wisan dike, heke mirov be yan cin be, kî
hebe, ew êdî hîn bûye, helbet wê careke din jî bê.
Ev hewqasa serbaz, polîs û serdar li hawîdorê
koşkê hene, nebî yek ji wan be tê wisan ruyê min
diherimîne? Ev e deriyê jêrîn radayî ne û mifte
jî bi min re ne. Lê nexwe ew belqitî. di kur re tê
vir, gelo? De wa îşev jî çû û necamêr ya xwe bi
71

min kir. Lê heger min ew qefaaa1t, jixwe ez
dtzanim ku ez ê çewa wî mengene bikim. De ka
hetanî şeveke din jî Xwedê mezin e. Yan dibe ku

sertûrek e. dixwaze navê xwe bi yê min re
derxîne. da êdî kes bi min qayîn mebe û ez jê re
bimîniîn! Kî hebe bila bibe. helbet eger diz ne ji
malê 'be. nikare ga di kulekê re derxîne ...
Kela dilê Feyruşayê geh fûrtiya, geh daket, gahî
germ bû û hin caran jî sar ma. Lê her ku çû. ew
dehfê bi bal evîneke nepenî ve hate badan û 11
şûfê zilamê nenas fikirî. Yekcaran jî fikra
sertoreyekî beredayî dikir û ya berdoşekî sik ê
nelihevhatî dihate pêşberî çavên xezalî. Dilê wê
gel~kî bi wê bûyera xwedînediyar artya. kezeba
wê şewitî û xwîdaneke sar di eniyê re avête der.
Ew hin caran ji aliyekî ve dilxweş dibû, lê ji
aliyekî
ve jî dilreş
dima.
pir
diponijî
û ji
hinavên kûr axîn dikişandin.
Her carê qasekî jî
radibû ser nigan û diçû li ber neynikê disekinî. li
serçavê xwe dinerî û geh-geh bi qursên di ruyê
xwe de dikeniya. gahî digirtya , carinan jî mîna
ku bi wan re bipeyive. xwe bi xwe digot: De tiştên
wisa normal in. Lewra ez hêj qîz im û nebûme
namûsa tu kurebavî. Lê ez bextreş bûme û gelek
nîr 11min bihurîne. De ez çi bêjim. hema Xwedê

bila ji bavê min re nehêle û yeka wî neke didu.
Eger wî zorê bi min re nekiribûna.
niha kî çî
dizane belkî ji zû ve bû ku qismetekî xêrê ji min
re jî der~etibû
pêş û ez niha bûbûm diya çend zik
72

zarûjî.
Di qatê jorîn yê koşkê de, germî û bayê
mexlûte timî hevûdu dihingavtin, her ber û gerra
xwe diguhaztin û li yek tayê nediman. Geh di
nava wan de ken û evînê xwe rûqalî keçikê
dikliin, gahî şîn û girî ... Erê şîn jî bi şênîyê re
bûbû heval, xwe kiribû hevrî û qeder. Ew yek an
kar bû, yan jî xisar bû. Lê eger ne tirs û saw bûna,
eger zanîn û başî hebûna,
ne tirs karibû xwe
derxistina holê û ne jî zor û zehmetî xwe
diavêtin pêşîya hedefê. Na li wir tirs û vln, saw û
rûreşî li pêşberî êkdû dicengtyan û hîç qada xwe
ji derb û beran vala nedihîştin. Wek mesela ku
dibêjin, Xem ketibû nava xwe û Cem, ew jî her
wisan ketibû nava bihşt û dojoyê. Yan keçikê wê
serê xwe bidana şûrê xezebê û bê ku ageh ji
tişteki hebû, yan jî wê bigihana daxwaza ku
hertim lê diramiya.
Erê roj bi bêhed anî xwe gihande êvarê. Êvarê

di derengiya şevê de, çaxê raketinê bihurîbû û
Feyrûşa dihênijî, ji ber hovîtiya xewê, xwe 11ser
nigan ranedigirt, hema diçû wî serî û dihate vî
serî. Lê her ku dem û an berepêş ve çûn, xewa
jiyanê jî hovîtiya xwe nîşan da û hahaye ku wê
terayî erdê bikira. Bo wê çare nemabû, tenê du
mecan mabûn: Ew yan wê raketina, yan wê şevê
jî

dê

gewriya

xwe

bikirina

hirmiya

devê

bengiyekî nenas. Lê jana t111yêzû hate hişê wê.
Ku di rojên bi teşqele de kurebav û qîzebav xwê
73

dixin birîna tiliyan û ji ber êş û şewatê nikarin
êdî rakevin. Ew jî rabû bi kêrê tiliyeka xwe
qelaşt û birînê tije xwê kir. da ji ber şewata ji
xwê ranekeve. Îcar piştê. de ez çî bêjim; hema
xêr û xweşî li we bibarin. êş û kêş jî li Feyruşayê
bariyan. Geh vir de çû û li hawîdor nerî. gahî
bêpêjn ma û guhên xwe li hatina yê ku li pawukê
dima tapêl kirin. Hin caran jî xwe bi xwe digot.
bila ne bi vê êş û jana tiliyê be. bila bi şerm û
fediya qursa ruyan be. Lê diviya ku binase û

bibîne ka ew kî ye û çî kes e. Di wê navê re
kurtedemek bihurî. Feyrûşayê dengê terpîna
tiştêkî ji ser banê koşkê bihîzt. hema zûzûka çû
xwe li ser text dirêj kir û dev bi xirexireke mîna
ku di xew de çûbe kir. Erê di binê temeziyê de bi
çavên xwe dît ku wa xortek hat û kete hindurê
oda wê û rind bala xwe dayê. xwe bi xwe got: Gelo
ev hêjaye wan derd û kulên ku hewqasa

ez

dikişînim?

Erê. wê bi qîmê ew begem kir û jê re
heyran jî ma. Nerî ku xort. xortekê pir bedew.
lihevhatî û xwînşêrîn e; çav û birûne reş ên
qerqaşî lê ne ku dilê wê bi jan dîkin. Jixwe bejna
yekta. dil lê dîmirîne. Keçikê hema xwe bêpêjn
kir û di binê bijangan re Lê ziloq ma û çav jê
neniqandin.

Xort. ew şev li tiştêkî din nefikirî. Ne bala xwe
da xwarinê. ne bala xwe da ava sêwil û ne jî berê
xwe da sêva di devê sêwil de. Ê ziloq bû li

~e~~

li ser text nerî. Hêdî hêdî ber pê ve çû.

74

li ber text rawestiya

temeziyê ji ser ruyê wê

û

hilanî. hêdîka xwe tewand û kir ku ruyê wê maçî

bike. Lê hema keçikê xwe çeng kirê û hişk bi herdu destekê wî girt:

- Kuro. tu çi kes î?

Gurgîn ji tirsan, mîna şêrê ku di rikêbê de dimelise. di nava destên narîna xewê de şemirî, ji xwe re sar bû û cemidî, devê wî hate qefaltin, erçûmekên wî bi hevûdu ve zeliqîn. ji xwe re şaş bû û ziloq ma Lê nerî. Lê ew cemidandin û xemxwarî pir Lê nedomandin, piştî bizaveke

Rostemî xwe li gurçikên wî geş kir û xwe bi xwe di dilê xwe de got: Ma ez ê ta kengê vî kumê şerpezetiyê li serê xwe bihêlim? Ez lawê Baroz Paşayî me, cewrê Binefşa keleş im û kilê çavên te çavbelekê me. Ev car, ne cara pêşî ye, ne jî dibe cara paşî.

Îşev ez ê te li can û cesedê

xwe

bihelînim. Hema neyaho ji ba te keçikê. Di kur de qalind be, hema bila di wir de jî biqurife:

- Keçê hiş bel Delala min, jiyana min. Dengê xwe zêde demexîne. Jixwe va ez dîlê te me. Tu li min diborî jî tu dizanî, eger tu min celad jî dikî fermo. Eve stuyê min û eve şûrê te ... Lê eger tu çi bi min dikî bike, lê qenim bila kes bi me nehise.

Dema

Gurgînî

ew axaftin

kir.

pêre

pêre

partavên Feyruşayê şikestin, fûra dilê wê daket
jêrê, xezeba wê damîçiqî. bîstikekê rawestiya û
piştire bi nermî dev bi pirsan kir:

- Tu çewa hatî vir?

75

- Nepirse.

- Gereke tu xwe bi min bidî naskirin!

- Ez kurê Baroz Paşayê welatê Pêncşayê me.

Balafireke min a jînê heye. Ez lê siwar dibim û çî
devera ku dilê min bixwaze bifirê diçime wir.

Çend roj berî niha ez û hevlekî xwe hatibûne

ber keviya vê deryayê. me masî digirtin. Min jê.

pirsa vê koşka te kir. wî got. ku "Ya Keça Qirêl e.

Bavê wê ew bi zorê dida kurê birayê xwe. Lê wê

lawik neyaye. Îcar bav wê sirgûnî vê giravê

kiriye." Piştire min xwe bi xwe got: Ez ê herim

cem keçikê. Heke bi min qayil bibe, ez ê pê re

bizewicim! Îcar jixwe va ez dîlê te me. Heke tu bi

min qayil dibî, em bi hevûdu re bizewicin. Na

heke tu bi min qayil nabî. fermo serê min jê

bike. Jixwe eger kuştina min bi destên bedeweke

mîna te be. bo min şerefa herî mezin e.

Bi wan peyv û galgalên Gurgînî. dilê horileyna

bêmiraz serobinê hevûdu bû û xewirî. Lê hin

caran dil lê miçigî. geh reqisî û têlên tenbûra di
nava xwe de jenandin.

Her ku çû dil Lêvebû. bi

li serçavê

balkêşî

nûranî

nerî.

dît ku lawik

xortekî wisan bedew e qey tu dibêjî hema hêk
qelişîye û ew ji navê derketiye; bejneke şaxîn Lêye
eynî dişûfe şitla rihaneke ragirtî û mîna ku li
ber kaniyeke Sîpên hatiye avdanê. wisa rind û
lihevhatî ye. Du çav û birane reş ên qerqaşî lê
ne. ku dilê periyar jê re dimeye û pozekî beranî
yê kêrr li ~erê ye hema nola bazan xwe xîjê
76

nêçîra karxezalan dike. Du gurçikên grover ên
lengerî digel dev û diranîne sedefî xwe jê re
dîsînî û pêşkêşî dilê wê yê birîndar dîkin.

Herweha wan di 1ê gelek keçên

mîna wê

hingavtîne û ew birîndar hiştîne.

hem jî bi

birînine axivî yê xedar ku xweşkirina wan ne
karê tedawiya bizişk û hekîmên dinyayê ne. Erê.
bê ku ew keç xwe bigehînin xortekî wisan bedew
ê nazik, dil li wan kerker bûye û ji evîna

dilawerane re canê nazin bigorî kirine. Piştî
rawestineke ne dirêj, îcar Feyruşayê xwe bi xwe
fikirî: Gelo ez ji vî xortî çî bikim. çî nekim? Te
dît bavê min jî zordestiyeke pir mezin li min
kiriye û ez xistime vê girtîxaneyê bedew. ku ruyê
mirovan jî nikarim bibînim. Lê dibe ku hema
Xwedê vî xortê han ji min re hinartibe û qismetê
min jî pê re hatibe ber deriyê malê. Eger ez vê
carê bi qismetê xwe re nebim hevbeste. dibe ku
êdî careke din feleka malikwêran
bi min re hîç
xwe bi min bike. li
nekene
û hertim tinazên
dijminatiyê bidamîne,
ta roja peyayê qolfelekê
ku rojbaşî yan şevbaşîya xwe li min bide. Jixwe
heyf û xebînet e ku ez rabim wî xortî têxim nava
lepên serbaz û polîsan. Lê ka ez li encama bûyerê
binerim,
wê bi kur ve gerr û dewran bike û
bibeze, yan çerxa xwe biguhêre.
Di wê şeva bêdeng de. Feyrûşayê timê xwe li
mêvanê
berûsingan bi qîma dilê mirovatiyê geş
û xweş kir. Pêre, pêre evîna xwe spartê û careke

din bi çavine bo eyîşandinê bala xwe xiste nava
dilê bengiyê nûdîtî. Ha wisan qederek bihurî. ne
hisek ji mêvanê şevê hat û ne jî pisek ji
mazûivanê ... Herdu alî ziloq bûn û li bejn û bala
hevûdu nerîn. qederekî xweş rawestiyan. mîna
bilbil û gulê li nava çavên babetvaniya xwe
nerîn. Feyrûşay bê ku ageh ji xwe bimîne. ha ku
dît. ew di ber hemêza mêvanê xwe de ye. Piştî
xêrlihevxisUn

û hemêzkirineke
germane.

qasekî ji hev dûr ketin û bêdeng man. Lê pir neçû
vêca destên xwe xistin nava êkdu û sozê zewacê
dane hev. Ew şev li gorî zagona maketî. bê
şadewşûdên dinyalikê mara xwe li hev birrîn.
Gurgînê mêvan bi devê xwe, bi axaftineke qal got
û bi dilê xwe jî dubare kir:

- Ez di xweşiyê de, di reşiyê de, li her deverê.
heta ku jiyana

min bi domîne te ji xwe re bi

jinantî

dipejirînim.

Feyrûşayê jî lê vegerand:

- Ez jî di xweşiyê de, di reşiyê de, li her deverê û
bi her awayî, heta ku jiyana min bidomîne te ji
xwe re bi mêrantî dipejirînim.

Di wê derengiya şevê de êdî dema zavaUyê

gihabû serseda xweşiyê. Gurgînê Paşê dest bi

zavatiya xwe kir û Feyrûşaya keça Qirêl jî xwe bi
bûkant1yê pîroz kir. Lê ew serbaz û polîsên li
derve ku lê nobet digirtin,
bila hîç nebûna
birazava,
yan Serayîya
karxezal
a qerwaş jî
pe1?'Pq~1?er.bû~. pî~tr~ hindik neçû bûk û zava
78

ketin xelweta xweşiyê, dest û devan xistin nava
kêf û kêmûşeke xweşmeş; bû şeşeşeqa
ramûsanên nihênî, textê vegirtî ji biriya xwe
daketa û berê qada şerê wan kete ser xalîçe û
lopên raxistî; geh dahf û teqleyên nepenî ku
digihane vî dîwarî û jê gêndirî ba dîwarê din
dibûn, li dû hev beziyan û hirmîn û gurmî1ê
gihandin ta bi asîmanê banî. Leqeleyê teqereqa
vî banî, digiha cem serbaz û serleşkerên wî
asîmanî. Lewlebû kêriyên meşka çerxa cîhanî,
bi bez û lezeke wisa însanî gihane bihiştta canê
bêgiyan û ji nû ve jiyaneke nihênî êxistin nava
cergê xayîntiya feleka xapan. Her ku çû barê
herba alemî ber bi rindiyê mirovatî ya
sermedî ve hilkişiya û deftera reş wê gavê îq-spî
gêrandin. Ew şev çiqas serbaz û polîsên
nobetdar hebûn, her yekê wan gihane per û

diyarîne giranbiha ku tu salix û behs jê
nedihatin kirin. Bazê belek li kevoka serkesk
nêçîra xwe domand heta berdesê sibeha narîn.
Êdî diviya ku rastî bihatina înkarkirin û
nerastî ji bibûna rastî. Piştî Gurgîn bi peyveke
şîranî, rabû xatir ji şêrîna şevê xwes û eniyê
gevermaçî kir, çû ser bên û li flifirokaxwe siwar
bû, çû liber mala Pîrê danî û derbasî hindur bû,
bêpêjn kete nava ciyêxwe û raket.

Gurgîn ew roj heta nivro di xewa şêrîn de ma
vemirî. Gava çavên xweji xewa neraht vekirin û
firavîna xwe xwar, mesela xwe û keça Qirêl ji
79

Pîrê

kurê wê re jî got. Pîrê bi sehkirina meselê
û

gelekî tirsîya û ji Qirêl pixv kirin. ku ew dê wan
11

qazoxê bixe. Lê kêfa kurê wê pir hat û serkeftin
ji birakê xwe Gurgînî re xwest û rabû çû qada
eniyê maçî kir.

Ji wê şevê û şûnde êdî Gurgîn her şev bi
firftrokê diçû cem jina xwe. ta nêzî sibehê li cem
dima. dîsa vedigeriya dihat mala Pîrê û dikete
nava ciyê xwe radiket.

Qiralê bajêr hertim li keça xwe bi rik. bi xeyd û

xezeb bû. Her ku diçû jî pêşîgirtina têkiliyên
keça xwe ji mirovan dibirî û nedihîşt ku qenim
wê ruyê

derve jî bidîta.

Lê wî hîç guman

nedikirin. wê rojek bê ku keça wî dê li pêşberî wê
zilma ku lê dikir serî hilde. yan bi daxwaza xwe
mêrekî ji xwe re bibîne û hîç nebe belkî pê re
bireve. Erê ew roj hatibû jî. Lê hay û gumana
Qirêl jê nemabû. Keçikê mêr kiribû û lijiyaneke
nû jî dimeşiya. Erê. ew jiyan her çiqasî xweş û
şadan bû jî. Lê xweşiyeke pir bi nihênî û pir jî
nixumî diçû. ku hewqas serbaz û polîs li dora
koşka wê hebûn jî pê nedihisiyan û jê gumana
tiştêkî wisa hîç nedikirin.

Di wê navê re du-sê heftî bihurîn. hema carek
ji nişka ve dewxa Feyrûşayê hat û dinya li dora
~erê y.rêZMrî. dorbû û piştê çend elqên vereşanê
80

xwe Lêbezandin. Ew dewx û elqên vereşanê her ,lê
domandin, geh sekinîn û gahî lê vegeriyan, ta ku
meha wê kuta bû. Îcar carekê bala xwe dayê ku
zik lê gir dibe, her diçe diwerime û dinepixe. Erê,
heta wê demê jî tu nexweşîneke wilo li xwe
nedîtibû. Ji ber wê yekê pir tirsiya û xwe bixwe
got: Gelo, ev çi hewalê min e, ev çi nexweşîn e? Lê
bivê nevê, hin caran tişt ji bîra mirov diçin, çi ji

xemsa rî be, yan ji netêgihandinê be, pirî ku hin tişt xweşî û xweşyeta xwe zêde li mirov tîn dikin, bo wan hesabê sibe, yê dusiban nayête kirin. Îcar berî mêrk1r1na Feyruşayê jî, hîç girbûna zikê wê nedihate

bîrê û hîç nedihat

bîra wê jî ku çu

caran roj bi perdê nayête veşartin û rim jî di têrê de wenda nabe. Rojekê ha ku Serayîya qeıwaşa wê dît, wa zikê xatûna wê nepixiye û ber bi devê wê ve hilkişaye.

Lêbelê wê bi xwe jî eseh

nizanibû ku ew nepixandina

zikê xatûnê, gelo ji

derdan e, yan ji mêran e. Hema ziloq bû û lê nerî, nerî heta ku bala xatûnê jî ket ser çavên wê. Ew bûyer, carekê bûbû û ciriya bû. Lewra ew tore û kiryar, ji pêxemberan

ve mabûn û ta bi roja îro

jî her domandine. Qeıwaşê serê xwe daxiSt jêrê û

ji fihêtan hew li zikê xatûna xwe yê gir nerî. Lê

gava ku xatûnê îcar li zikê qeıwaşê nerî, piştire

destê xwe li ser zikê xwe gerand û lê nerî, hingê

fam kir erê rast e, ku mast ji şîr çêdibe. Piştire

hêdîkan di ber xwe de got qeıwaşê:

- Keça delal. Ez li bextê te û Xwedê ketime. alla

81

kes ji devê te seh meke.

- Na, xatûna min. Tu ji sola xwe re dibêjî.

Qeiwaş hêdîka şûnde vegeriya, daket qata jêrê
û rast çû ba berpirsyarê parasinê. Bi uuûda ku wê
diyariyeke mezin ji Qirêl werbigire, got:

- Tu zanî çî bûye?

- Ka bêje.

- Keça Qirêl zik li xwe kiriye mîna def, hem jî
defa hewarê.

Berpirsyarê parastinê bi wê xebera "bêrê" pir li
ber xwe ket û di dilê xwe de sêwirand: Heke Qiral
bi vê meselê bihise, wê serê min jêke. Lê ha va ev
forq jî pê hisiyaye. Îcar ez ê çewa bikim? Hema
şiveke ter û li

wî yekê nekir

didu

û rahîşt

qeiwaşê xist, lê xist û lê xist heta ku ji kerê re go
şooş dadê tobe! Piştî îcar dev ji dijûn û sixêfan
berda û bi axaftineke nerm gotê:

- Di şûna ku tu eyba me veşêi, îcar tu têtî van
xeberdanê eletewş ji min re dibêjî. Ne, eger Qiral
bi vê yekê bihise, wê serê min û te tev Jê bike. Erê,
te li vir got, lê hay ji devê xwe hebe û li ba
hinekên din mebêje.

Çewa ku serokê

parastinê

Ji eşkerekirina

meselê

ditirsiya,

herweha

tirseke

mezin xwe

bera ser dil û hinavên Feyrûşayê Jî dabû. Lewra wê rind dizanî ku qerwaş, eger Ji bo stendina diyar1yekê be Jî, dikare xeberê bigehîne bavê wê.

Ewçax bav dê serê wê jê bikira û yê berpirsyarê

~rî?az]1 polîs~~ nobetvanên

wê Jî di ser de

82

bigêndirandina. Ji ber hindê Feyrûşayê kete

nava tirs û tavila serê xwe û cfilî ser hevûdu ...

Qerwaş jî ha îro. ha sibe. di rojêke bet1ana xwe de berê xwe da mala Qirêlû çû. meselêjê re got:

- Bavo. Wele ruyê min ji te diêşe jî. lê eger tu destûr bidî. ez ê tiştêkî pir girîng bibêjime.

- De bêje. keça min.

- Keça te Feyrûşa ...

- Êêêh?

- Zikêwê...

- Te got çiii!

-II!

Ji çeknas û xwenasan re. jixwe gotina "s"ê yan

sîr e. yan jî simaq e. Êdî wî meselê fam kir.

pêdiviya dirêjkirina gotinan nemabû. Lê ew

gotina Qerwaşê pir li zora Qirêl çû. gelekî bi mesela keça xwe êşiya û li ber xwe ket. Li ser wê meselê. rabû zêdetir serbaz li giravê bi cih kirin û fermaneke taybetî jî da parastinê ku liwê yekê bikole: eger têkiliya keça wî bi hinan re çêbûbe. ew kî be û li kur be divê peyda bibe û werînine cem wî.

Ha wisa şevêk. du şevan. na tu bêje heftiyek. du heftî bihurîn serbaz. polîs û parastin tevgera xwe kirin mîna kunemozê û li çaraliyê baj êr geriyan. li hawîdorê giravê û li keviyên deryayê rêzbeste qordar bûn. Lê wan çu kes nedîtin û tu delîljî bi dest nexistin. Lê belê Gurgîn her şev bi firfitoka xwe diçû cem keçikê û heta berdestî

83

sibehê dima. dilê kesirî hêsan dikir û şûnde vedigeriya diçû mala Pîrê û radiket.

Belam gava ku ewqas ger û gefên serbazan bêencam man. piştî parastinê got ku. hebe tune be ew kesê tê cem qîza Qirêl. ne di deriyan re lê di ser banê koşkê re tê hindurû. Divê ku serê bîn bête parastin. Eger ne wisan be. emekê me lihaş diçe. Îcar serbaz çûn serê banê koşkê hemû bi qîr û zivtê seyandin û mîna berê dîsan jî li ger û tûrên xwe dom kirin.

Gurgîn gava ew libat û tevdîr ji serbazan ferq kir. bi qederê çend rojan xwe di mala Pîrê de

ragirt û neçû serdana evîndara xwe. Lê di şeva li dawiya heftiyê de gava li firfiroka xwe siwar bû û çû li ser banê koşkê danî. firfirok di qîr û zivtê de asê ma û kir û nekir nikaribû jê derxîne.

Feyrûşayê ava germ anî bera ser qîr û zivtê da. Hinbihin ew qîr û zivf nerm bû û heliya. Gurgîn firfiroka xwe jê derxist. Lê Feyrûşayê got:

- Êdî bi vî awayî çênabe. Divê em ji vir herin.

Ekene. em herdu jî kuştî ne.

- Ê de ka heta şeveke din jî.

Sibehê zû gava serbazên Qirêl çûn li qîr û zivta li ser banê koşkê nerîn. malikê tu xirab î. dîtî ku wa tê de hin şop tene xuYakirin û ew qîr û zM bi ava germ hatiye helandin. Piştî mesele ji wan re eşkera bû. ku diz ji malê ye û hewceyê ku yekî bigota va ye hirç. ê din bigota na va ye rêç nedikir.

Parastinê

ew kiriyara

qîr û zivtê bi

84

Qiralê xwe da zanîn. Qirêl di wê gavê de fermaneke taybetî da Ordiya Heleguran. ku malo mala li nava bajêr bigerin û kîjan zilam an xortê gumanbar xasma yên ku bi kincên wan ve çilkên qîrê hebin. bigrin û bînine cem wî. Ew

ferman di eynî gavê de pêk hat û serbaz ketin helegurmê; xwe bi kinc. çek û berikên alavî tekûz û rapêç kirin û berî kazima sibê li nava bajêr belavbûn. hemû kuçe û dirb vegirtin. Çi zilam û xortên ku wê sibehê ji mala xwe derketin derve da herin kar û îşê xwe. ew girtin û yeko yeko li kincên wan nerîn. piştî ew vegerandin malên wan û hindurê malê qul bi qul sehkirin. Gurg-in û Gêyo jî ew sibe hinekî zû derketibû ne derve ku herin sûkê û bîstikekê ji xwe re bigerin. Lê li ber deriyê hewşê ew pêrgî serbazan bûn.

Serbazan herdu girtin û ew berçav rakirin. Çima çilkek qîr bi devdelinga şalê Gurgînî ve nedîtin! Û bê ku tiştêkî jê bipirsin bi milê wî girtin ku bibine cem Qiralê xwe. Lê Gurg-inîgot:
- Hûn biborin. Min çeltikê xwe li hindur jibîr kiriye. Ez ê herim bînim û werim. hêj min bibin. Yek ji serbazan hate "wijdanê" ku destûr bidinê. da ew here çeltikê xwe bîne. Gurgîn gava vegeriya hindur. hema çû firfiroka xwe ji çeltik derxist. per û baskên wê li êkdu edilandin û lê siwar bû. firiya û bi hewa ket. Serbazên li ber derî ha ku dîtin. ew xort litiştêkî siwar e û wanê li hewa difire. çend berik bera wî dan. lê ew

85

nehingavtin.

Îcar serbazan

ji fediya

ku wî

tawanbarî ji destên xwe berdane. hîç deng
nekirin û negotin serdarên xwe ku wan yekî
kincbiqîr ji destên xwe filitandiye. Lê Gêyoyê
lawê Pîrê bernedan û wî bi xwe re birin. Her dîsa
leşker û serbazan li seh kirin û kontirola nava
bajêr domandin ...

Gurgîn gava bi hewa ket. rast çû li ser banê

koşka li giravê danişî û gote Feyrûşayê:

- Rabe. em zû herin. Vê sibehê serbazên bavê te
ez girtim. Hindik mabû ku min bibirina cem
bavê te. Lê min zû xwe ji nava lepên wan filitand.
Feyruşayê pir tirsîya. qutifi ser hevûdu. wisan
jî biliya ku êdî nikaribû rabe ser nigan. Lê
Gurgînî ber dilê wê da. ku tiştên wisa normal in
bêne serê mirov. piştê gotê:

- Hîrmet. "Şêr şêr e. çî jin e. çî mêr e." Divê ku
pêşî bawerîya

mîrov pir bi mîrov hebe û di

tengasiyê de zîrek bilipike. Eger ne wisan be. dê
mîrov bibe êmê hespên zordaran.

Di wê gavê de hema mîna ku aveke germ pê ve
bê. rabû ser nigan. lê çavên wê tarî bûn û li dora
xwe doş bû. dîsanê ket erdê. Gurgînî ew da ber
hemêza xwe dîsa teselî kir. Ha wisa hinbihin
bevzê wê xweş gêrra. bi xwe ve hat û mîna ku ji

xew biveciniqe

badanekeyeka

tiroşane

ew

şidand. damara tirsê xwe ji nava çavên wê sist

kir û rabû ser nigan, çû hinek hûrmûrên

sivik

civandin. xistin nava buxçikekê û ew û Gurgîn

86

derketin ser banê koşkê. li firfiroka xwe siwar

bûn û bi hewa ketin.

Firr li ser firrê. bi xaz û xîr. bi bez û lez zû

ketin nava ewran û ji ber çavên bejê wenda bûn.

Lê ew roj ewrekî reş ê tarî xwe li ser taqê

asîmanê bajarê Qiralê biyanî vegirtibû. ku bi

du-sê sedan nêzî erdî didanişî. Geh wan destên

dostaniyê diavêtine serê çiyar û gahî xezeba xwe

li ser wan dibarandin. Lê bi bi xweşî. bi hêsanî rê

dan firfirokê. da bi rêwîtiya xwe ve here. Gava

firfirokê ew herêmên tarî bihurandin.

kete

herêmeke zelal a şûledar ku ne serî dihate dîtin

û ne jî ber jê re dihatin pîvandin. Erê asîmanê

bêser û bêber ... Ji taqê wî asîmanê banî re ne

berek hebû ku Gurgînî deverekê binasiya. ne

ku xwe li tewra

serûber

hebûn
raste riyekê
bişûtikandina
û ne jî rawestingehek hebû ku ew
û jina xwe qasekî Lê bisekinyana. da hinekî
bihna xwe berdina. yan jî karibibûna ger hindik
bûna jî dest bi jînenîgariyeke
bi şeng û peng
bikirina û pîrozbahiya
erdê pîroz li xwe pîroz
bikirina. Erê. rêwîtiya wan ber bi welatê bajarê
Pêncşayê ve bû. Ew devera ku bêzanîn jê hatibû
welatê biyanî. bajarê Kevîgolê. Lê Gurgînî kir û
nekir rê ji rê demexist
û tu rêwî û bazirgan jî
rastê wan nedihatin.
Ha wisan bêpergal firiyan
û çûn. lijora banê dinyê geriyan û hey geriyan.
Hin caran bi ewran re axivin. hin caran xwe bi
xwe peyivîn û tu bersîn negirtin. çu deng liwan
87

nehate
vegerandin.
Hin caran
jî gava nişiv
dadiket. bi berf û baranê re diaxivî, wan jî her
wisan jê re bédengiya xwe diparaztin. Bi wî

awayî saetek, didu. sisê 11
mexera bêkes geriya û
fir 11ser firê dubare kirin.
Dema firfiroka wan
hevraz dibû. dikete nava tîrêjên şûledar û riya
wan ber bi kurahiya valahiyê ve berepêş dibû. Li
biniya
wê jî pişta
ewran
xwe yekkere
reqaftlbûne êkdu û 11
hin deveran serê xwe bilind
dikirin. Herwekî di binê wan de Çiyayê Cûdî. yê
Mereto. Sîpan û herdu Çiyayên Agirî taca serê
xwe bilind dikirin û qebûla tişteki 11
ser serê xwe
nedikirin.
ewr ji tangava
serê xwe bi jorê ve
dehfdabûn
û wan ber bi taqê jortirîn ve
dihinartin.
Li hin deveran jî kortayî di xwe de
çêdikirin û mîna gelî û newalên kûr î fireh şînatî
vedînişandin. Belam ew rewşa xwezaya ewran
bala Gurg" inîserobin dikir û d1k1r1n ku ew rê ji rê
demexîne. da nizanibe 11riya xwe b1fire û here
xwe bigehîne bajarê Welatê Pêncşayê. Jixwe kêf û

geşta

Feyrûşayê

gihabû

quntara

gulîstana

bilbilan û daxwaza ku ji Yezdanê dilovan dikir,
ew bû ku ketibû navê de. Lewra hem mêr bi dilê
wê yê birîndar

bû,

hem tama

jiyaneke

nû

hildabû û hem jî bê ku hay 11dek û dolabên
felekê bimîne li deşta sipî ya lijêrê xwe memaşê
dikir û hin caran ber bi asokan ve jî dinerî. gerr
û pergalên vê gêt1ya serxweş bi çavên xwe didîtin.
Lê di wê rêwîtiya bêmîşan û nebeyan de. carekê
88

hema ji nedî ve wê bi nava xwe girt û sancorê ew
teyişand, her ku çû hovîtiya xwe Lêzêde kir û
kete ber êşîka zarûkan. Li wê deverê, li wê
herêma sar a vala. ne pîrik hebûn ku jê re pîriktî
bikirina, ne livîn hebûn ku wê germ bikirina û
ne jî xwarineke ruhn a tîngermî hebû ku nava
wê hinekî
bisincirandina.
Gurgîn jê re ket

mabeyna tavil û taya ji tirsî li zeriya xwe. Zerî
xatûn jî kete nava tirs û şadiya bêyomtiya xwe.
Ha wisan geh ev tirsîya, geh ew tirsîya,
bêhedaniyê ew herdu jî bêgav hiştin û bi dengê
melûl xatûn qêriya:

- Delalê min. Tu çî dikî bike, zû min bigehîne
erdeke. Ekene, ezî dimrim.

Gurgîn li wê hişkesayîya asîmanê banî ji xwe
re

heyirî

ma.

Lê daketina

erdê

jî bo

wî

sergêjiyeke mezin diafirand, bonê gelekî zehmet
û ezadar bû. Pa çî bikira rebeno! Wekî din tu çare
û mecal nemabûn. Hêdîka pîlê firfirokê hevraz
kişand û firfirok bej êr daketin, şûtî erdê bûn û
çû gihane biniya ewran. Lê de îcar çî bibînî! Şev
e, ruyê dinyayê tarî ye, wisan tarî û şevereş e ku
mirov tiliya xwe di çavên hevûdu rabike, kes
kesî nabîne.

Weyla malikê tu xopan bibî! Lê

bejêr kişyan û firfiroka wan çû li ser çiyayekî
bilind

ê xiruxaliyê ji wargeh

û mirova giha

edrdê. Feryûşa pir cemidê bû, ji serman dirihilî,
dev û lêvên wê yên nazik diçikçikîn û şeşeşeq ji
diranên sedefî dihatin. Hin caran wisa dilerizî

89

ku tayên porê zêravî ji ber xwe ve dest bi reqs û
govenda navki1ê dikirin. hin caran jî mîna ku bi
cergebazî û sêpê dileyîztin. Hem nexweşa bi êşîka
zarûkan ve û li wêrê ne germiyek hebû da xwe
hinekî bi germiyandina. ne jî xwarinek hebû ku
kewa devê xwe bistandina. Tenê çare û daxwaz.
bi umîd û belkiyan ve mabûne bestekirin. Gurgîn
jî ziloq lê nerî. erê pir li ber diket. Lêhin caran
wê teselî fikir û bevez Lê diwerpixand. Belê hîç
feyde û çare nebû. her ku çu barê bargiraniya
teqldariyê xwe lê bargirantir fikir. Herduyan li
ber êkdu dan. de niha be. de gaveke din be. ha ku
dîtin tavanê şevê xwe bi şevbaşiyêke bêumîd re
gihande serê pozê çiyayê bilind û mîna konekî
reş ê erebî tarîtiya xwe li ser wan girantir kir û
stûna makê li binê çik hêla. Piştê jî bayê seqemî
bê şerm û fedî xwe li hawîdorê wan alifand; bi
guregur û fîrefir loriya. hin caran mîna segan
ewtiya û geh jî weke guran zûriya. Ê piştê jî. dor
hate ser gur û hirç ên birçî. Wisane zirp bû zûrîn û
horrîna
gur û hirçan
ku bi hêlîdana

wan re
dengvedêrî kete lat û zinarên li hawîdorê çiyê.
Şeva şeverêş a xezeb dar . ne hindik belê bi
xwe li nexweşa
qîma dilê xwedîdilan
bedew
arand. digel sermayeke hişk û bahozeke bi şid ku
xwe li ser nigan
meriv nikaribûn
rabigirin.
Gurgîn ji ber wê zikreşiyê
geh kincên
xwe
û li kezîzerê pêçan.
derxistin
geh wê da ber
hemêzê û bi hilma xwe hinekî wê germ kir. hin
90

caran jî laşê xwe ji serman dixurand û tevzûnek
li dorê bazî dikirin. Lê her ku zêde çû. ew bêtir
teyişîn. Piştîre bala xwe dayê ku ew tişt ne çare
ne, îcar çavên xwe li hin riyên din gerandin. di
ber xwe de sêwirî û kete nêv gerîneka xem û
ramanvaniyê.
Feyrûşa jî kete ber zarûkan
bê
sihûd û sancorê xwe lê zêdetir kir. pê re jî qîr dan

û jê helahela. feryad û îmdad hilatin. Feqîro ji
ber êşîka wê semax nekir. tebat pê neket û rabû
çû derkete ser zinarekî bilind 11hawîdor nerî. ka
li deverekê cihekî şên nabîne. yan ji aliyekî ve
dengê segan nabihîze ku xwe lê bigre û here wir
da hinek xwarin. kinc û agirekî jê re bîne.
Erê. "wa agirek ji dûr ve dixuyê, çirîskên wî
digehin ta bindestî asîman. Belkê xwarineke
germ jî hebe." Xwe bi xwe qêriya û daket jêrê. bi
kêfeke zêde got Feyruşayê û şahiyê cih nedayê ku
ew debar bike. Çirîskên agirê gurr xwe li nava
çavên Gurgînê
dixistin û jê re umîdeke bêteql
çêdikirin. Lê pa çî agir? Ne Gurgîn dizanibû ku li
kur e û ne jî di wê tarîtiyê de dikaribû ku li
devera agir lê bihizire yan karibe rê rast bibe
wirê. Lê gelo ew agir ê cinan bû. yan perî ew ji
xwe re dadabûn,
belkî jî hin kesên rêwî yên
jirêketiyên mîna wî ew ji xwe re pê xistibûn û ji
xwe re hewqasa gurr î geş kiribûn.
Wekî din
tişteki ku bi umîda belkî bûna jî. diviya ku wî ew
ji xwe re nedihesibandina. Lê hin caran mirov
dlxe11te.Hema bi şûnde li f1rfirokê vegeriya û çû
91

Lêsiwar bû. Lê Feryûşayê xwe avête bext û torên

wî, gelek jê hêvî û zarî kirin da ew neçe. Erê Gurgînî diviya da ew zarûka ku çêbibe, pêşî germayîyê bibîne û sermayê nenase. Ji ber hindê wî guh nedan jina xwe û bi hewa ket, firiya çû ku here cem êgir.

Gurgîn di bîstikekê de giha wir. Bala xwe dayê, wa tu kes liwir nîne û agirekîji qoçên qirase yên mazî gurr bûye, binî tije pizotên sersot in. Ew çend caran li dora êgir çû, hat û qoçekî mezin bereçav kir. Hêdîka rahiştê, bir qurma wî bi paşiya firfiroka xwe ve grêda, bi dilekî şad dîsa Lêsiwar bû û firiya, bi hewa ket. Bi fira pêşî re kêfa wî pir hat, bi bayê re keniya û ziloq li devera ku jina wî Lêmabû nerî. Lê hîç li agirê li paş xwe ne fikirî û her bi xaz fir zêde kirin. Û bayê gur libilindahiya ezmên gurra xwe zêde kir, xezeba xwe barand û pêlên xwe li qoç xistin. Her ku çû êgir geş kir, ew har û dîn kir û pêlîdana gurriyê xwe li hawîdorî firfirokê lefand. Gurgîn bêçar ma û daket erdê. Agirê gewr jî her bo xwarina firfirokê mîna ku bi sond û selewat be, pir bi kîn û xezeb be, lê mijiya û kot û qewart heta ku parîjê sax nehiştin.

Gurgîn li jêra xwe nerî, dît ku rê nîne. Li jora xwe nerî, dît ku di ber perên ewra de zinar dixuyên. Gava li rast û çep nerî, dît ku her der û dever bi dar û daristan in û şeva tarî jî hovîtiya xwe rind şên kiriye. Tenê ew ciyê ku lê ketibû,

mîna groveriya bêderekê rasteqoziyek Ji tahtê pan xwe bi cih dikir. Pêre pêre xezebê ew hingavt, kederê ew dehfande nava xeman û xwe bi xwe got: Waweylêl Ev çi bû hate serê m1n. Ew rebena nexweş niha di çi halî de ye? Gelo ez ê çewan karib1m xwe bigehînim cem wê? Û kete mabeyna pêlên firat û zeriya xwe. Hem Jî bi stûxwarî 11agirê firfiroka xwe temaşe kir û hîç nebe, xwe 11

berê rind germ kir, tevî xeyl û êşa bo Feyrûşayê ne hedan pê ket û ne Jî umîdiyê ew parast. Li ser wî çiyayê bilind û di wê şeva kerrehişk de, ne alîkar hebûn ku Ji wan daxwaza alîkariyekê bikira û ne Jî rê û rêbiwar peyda dibûn ku sal1xekê Ji devera ku lê ketibû erdê hlldabûna. Qen1m riya çûkan Jî ew şev bi wir ve nediket. Ha wisan Ji xwe re peya ma û 11 çolê wê destbirrî bû.

Şev bû, şeveke şeveriş bû, şev gelek Jî tarî bû, her ku diçû tarîtiyê şêla xwe dubare dikir û pir Jî serma bû; kul1yên berf û baranê 11 êkdu dihatin.

Her der daristan, zinar, birrek, şkêrr, ssel, ferş û hindef û kort bûn. Gurgîn Ji ber hovîtiya şevê riya ber n1gênxwe nedît ku Ji şûna xwe bllib1teû

here. Lê bêgav bû ku biçûna. LewraJinik bi tena serê xwe 11

serê çiyayekî din mabû û di ber êşîka zarûkan de dinaliya. Geh rabû û nigên xwe berepêş avêtin, gahî terabû û li ser êkdu teqle avêtin, hin caran qotlanî bû û gêndirrî erdê dibû. Lê diviya ku biçûna. Bi wê tewrê, bi wî 93

hawayî li wan deran geriya, çû û hat heta ku roja bêser û nig ji aliyê ebra xwe ve derket û hindik rûyê xwezayê zelal kir. Ew çax Gurgîn tê giha ku Rojhilat kîjan e û Rojava jî li çî hindamê dimîne. Hêdî hêdî meşiya, bi aliyê cihê ku guman dikir wê Feyrûşa lê be. Meşilhal bû, lê xwezaya bê serûber rê nedida. Hema wî berê xwe rast da û çolebir çû. Erê çû û diçû, lê ew li çiyayê û latan rast hat, pir geriya, li banî û dahlan qelibî, berê wî kete serej êran û di nava geliyan de sere dor bû, geh derkete ser serê diyaran û kort û mesîl biwartin, gahî dakete nişiv û kêrahiyan. Hem jî bi gerr û gerryan, bi ketin û rabûn, çû û hat. Ha wisa çû, bi rojan çû, bi şevan kete qul û qewêreyan û xurê wî bûne karok, giya û petûta daran. Lê hin caran nerî ku ew li dora çiyayên grover dor û dewran dike û dîsa tê şûna xwe ya berê. Gelek rojên dirêj, gelek heftiyên dubare û çend meh bêhawe xwe lê îkandin. Lê ne hisekê û

ne jî pisekê ji Feyrûşaka
xwe hilda. Îcar ji ber
çûn û hatinê
herdu
nigên Gurgînê werimîn,
pêlava wî qetiya, kinc pê ve zinzilîn, dest û nig di
nava xwîn û xirarê de werbûn, birçî ma, tlhn bû,
şerpeze gêrra, perîşaniyê rind ew teyijand, hêsîr
bû, li çol û pasaran
belengaz ma, heta ku jehrî
kete girara wî.

94

Ne dawî li rîyan dihat û ne jî paşiya gêtîya
grover xuya dikir. Gurgînê Paşê jî her bi wî
hawayî li dinyayê terkese bû û li jina xwe
Feyruşaya ku di ber zaruyan de digevizî geriya.
Jina wî jî ew şev bi çarçavî 11hatina mêrê xwe
yektel mabû. Lê çend saet bihûrin. Feyrûşayê
nerî ku Gurgîn nehat. Şev bi nêvî bû. Gurgîn tune
bû û sermayê jî her ku çû kurrîtiya xwe Lêzêdetir
kiribû. Hem jî jinik nexweş. belengaz û perîşan.
bêpîrik û bêderman ... Gelo wê halê wê çewa be?
Gelo ev çi hat serê malxweyê wê? Nebî bavê wê
pêjna wî kiribû û attarekê hanîbû serê wî? Xwe
bi xwe digot û dibiland. Lê hin caran 11
ber xwe jî

dida. bi serma û seqemê re bez û colan dikir û
dida nişandan ku jinjî dikarin xwe liber tewrên
hovane rabigirin.

Lê mala nexweşîna zarûnak
hilweşe û ya sermayê jî bi ser ve. Her ku çû.
teqlên wê ber bi anîna zarûkekî bêwar ve
beziyan. Hem jî li warekî wisan zorkar ku
hebûna
hemû

awayên xwezayê 11 xwe rewa
didîtin û ji rêketiyan re bihna wijdanê nedianî
bêvila xwe. Lê ew warên wisa. hin caran jî xwe
dikirin kela mêrantî û mêrxasan.

ew diparastin

û singa xwe bo wan vedikirin. Lê di derengiya wê
şeva bê wijdan de. dengê qêrîna zarûkekî kete
guhên Feyruşayê. Tu nabêjî. ew şev ji Feyruşaya
bi tena serê xwe re hevalek hatibû wir û dixwest
ku ji pêşîra wê şîrê xîç vexwara. Lê ne hiş 11dê
mabû ku karibûna guh bide mêvanê xwe. ne
95

taqet Lêhêwirîbû ku bibziviya da xwe bilivîne.
ne jî dest û nigên wê dizanibûn ku tevgera xwe
bînin qeysa berê. Ma qey mêvanpenverî miribü.
yan kevir ketibûne dilê wê ku hewqas bê şefqet
mabû û xwe çikûz dikir? Erê, ew tişt ji nedîtiyan
re ken û kêfê tînin, Lê dîtiyan re şîn û girî.

ji

Zarûkek~ kurînî li ser serê wî çiyayê bilind
hatibû dinyê, lêbelê kurikî nedixwest ku ji şûna
xwe ya germ bihatina nêv serma û seqema
şevereşê. Pa lêwik çi bike! Helbet fermana
zayendeya xwezayê, ew bûyer di çarenûsa xwe de
bi cih kiribû û ji şertên zêdayetiya zîyê re dever fl
pêgir amade dihiştin. Jixwe afiradina bêwaran
jî pir bela ye; hebin jî bela ne û nebin jî belatir
in. Lê dîsan jî hebûn ji nebûnê çêtir e. Eger tişt
nebin, ji binî ve xirab e. Lê eger hebin û ne di
kam û qama xwe de bin, hêviya hêvîdaran jî eger
neçûbe ber bi dilovaniya xwe ve, rojên gewr pir
hene ku şaşîyan, çewtiyan sererast bikin fl
helbet wê çarşema bêşansanjî
rojekji rojan bête
ber devê deriyê berambertiya wijdanê. Feyrûşayê
gava destên xwe li hawîdor palandin. bevşikekî
pahn kete nava lepn wê û pê navika lêwik birrî,
piştire serê roviyê li dora hevûdu bada û grêk kir,
ew di nava potekî de pêça û da ber hemêza xwe,
çiçikekî ~e
xist devê wî. Lê devê tîfalê şilek ji
serman qeşimî bû, nedikarî zû lê bimije û şîrê
xîç bigermî daqurtîne.
Geh dê û gahî law ji
serman
diricifîn, dirihilîn

û dibû şerqeşerqa

96

diranên zeriye. Û weke dîsa, bi çavrêniya hatina
Gurgîne xwe bêdeng ma û geh jî li demçüya xwe
ya bi teşqele fikirî, ta ku roja sibehê serê xwe Lê
cîq kir.

Gava roja sibehê rüçikên xwe bi ser çiyayê

bêxêrdîn

ve hinartin,

sermaya

şevê jî hindik

hate

wijdanê

û hilmekê ji tîna xwe şkand.

Feyrûşa rabü çû ser hîmekî ü rind bala xwe da
derûdoran,

haylo malikê tu xirab î. Ku ew li serê

çiyayekî wisan bilind e, jora çiyê rüt. bê dar û

devî. hemû taht û zinarên sor û reş. ji ruvê çiyê û

berjêr daristaneke

gurr xwe lê pêçaye ku hirç

nikarin biqelêşin. Ji jor ve, nîvê dinyayê. heta

ku çavên yekî dibirre tê dîtin. Hingê îcar wê rind

zanî û têgiha ku derbê bi qîma dilê xwe cih

girtiye û yê ku rê derxîne. careke din bê cem wê

ne Gurgîne Paşê ye. Ewçax agirê bêumîdiyê ew

rind hingavt. Lê wek mesela ku dibêjin: "Şêr şêr

e, çijin e, çi mêr e". Bîstikekê ponijî, lê xwe li ber
bêumîdiyê
nemelisand,
xwe
qels
nekir
ü
baweriya bi xwe hingavte serê wî çiyayî ü çû kurê
xwe hilda,
ew bir çû li ber berojkê
zinarekî
sekinî. Wê, ew lawikê bêagehê ji dinyaya hinekî
da
ber
tavê.
Tîrêjên
rojê
ew berojk
rind
disincirand,
germiyê xwe bera nava laşê dê û
lêwik da. hinbihin xwê dan û reşêşîntiya ji ber
sermayê ku di laşê wan de çêbûbû, bi spîtayiyê re
cih da guhartin.
Piştî gixegix bi devê lêwik ket.
dê jî hindik rûgeş bû ü bi kurê xwe re şadî kir. Lê
97

ew şadî li Feyrûşayê pir nedomand. carekji nedî
ve dengê zengilekî bihîzt û serê xwe cîq kir li
aliyê jêrîn nerî. Îcar çi bibîne! Dît wa k<ırwanek
di wê şeveriya çiyê re tê û hêstir hemû barkirî ne.
Îcar gava ku hêstira pêşî ji nişka ve çav bi serê
wê ket, veciniqî û şûnde reviya, çû li hêstira li dû
xwe ket. Ew hêstir li ya din ket, ew li wê ket û
hemû li nava hevûdu qelibîn, mîna pêlt"n
deryayê yek li ser ya din siwar bû heta ya dawîn
û di navbera tahtan de li êkdu lefiyan, barên hev
qelabtin
û tevek di binê simên xwe de
perçiqandin. Îcar gava ku Serbazirganê karwanê
rêwiyên ew sosret dît ku şûşeyên barkirî tev
şikestin, li hefadên xwe qêriya:
- Ka herin. Ew çi li pêşiya rê heye ku hêstir jê
tirsiyan. Ew çi be. av Lêvenexwin û hema bi şür
bikujin.
Çend peyayên sivik hema şür ji kalanên zêrîn
kişandin û bi xezebeke çolane beziyan çûne serê
pêşî yê hêstiran. Dîtin ku wa jineke bi dergûş xwe
li keviya rê daye ber berojkê zinarekî û bi tena
serê xwe rûniştiye.
Pêre, pêre partavê
wan
li wan agirê hêrsa
şikestin,
dilê

tije xezeb

vemirî, ji şûrên wan çirîskên tûj vemirîn û bi dengekî nizm ber pê ve çûn:

- Xwişkê. Ev hêstirên me wiloji te tirsiyan?
- Birano. 'Weleez nizanim!
- Tu bi tena dergûşa xwe livir çî dikir
- Min şûyê xwe wenda ~iriye,rê li ber m~

98

wenda bûye û ez nizanim dê bi kur ve jî herim.

Hema min û pitokê xwe, me xwe daye ber vî berojkê hanê û li pawuka çarenûsê mane.

Peyayên bazirganê riya dûr û dirêj şûnde vegeyriyan, çûne ba serbazirganê xwe û jê re meselê gotin, ku jineke bi zarûk li ber zinêr xwe daye ber berojk û hêstir jê tirsiyane. Piştîre îcar Serbazirgan bixwe çû ba Feyrûşayê û lirewşa wê ya şerpeze nerî. Erê, dît ku serçavê wê ji serman deqdeqî bûne û reşûşinatî tê re dixuyê. Lê dît ku ji birçiyar lêvên tenikî mîna erdê qirac bi ser êkdu ve cîfilîne ser hevûdu û bi çavine melûl lê dinere. Serbazirgan li belengaziya wê fikirî û bi rewşa wê ya xirab pir ponijî, gelek jî ew ji bo lêwik dilêşan ma.

- Xwişka min. Çima tu tenê wisan livir î, li ser vî çiyayê bilind?

- Birawo. Ez û zîlamê xwe di vir re dibihurin û li me bû şev, gelek jî serma rabû. Zîlamê min

agirekîji dûr ve dît. Ew çû ku hinek êgir bîne ûji
me re agir dade. Îcar ji êvarê ve çûye û êdî nehat.
Ha piştire ez jî li vir welidîm û Xwedê vî kurî da
min. Em li bendê mane heta ku ew bê. Lêgelo îcar
ez nizanim çî hate serê wî?

Piştî ku Serbazingên

serpêhatiya

Feyrûşayê

fam kir. îcar lê doman û zêde tişt jê pirsîn. Ha
wisan axaftineke zêde di navbera herduyan de
domand. Her ku çû, Serbazirganî

gelek tiştên

cihê jê pirsîn û xwest ku rind wê binase.

Lê

99

Feyruşayê nediwêriya ku rastiya jikurbûna

xwe

birastî bigotina wî. Lewra wê guman dikir ku ew
bazirgan hebe tune be yê welatê bavê wê ye. Eger
gumana wê rast derketina.

dê serê wê li

celadxanê bigêndirriya. yan jî na bi umîda

belkî-belkî bûna jî, wê talûkeyek hatibûna serê

wê. Îcar ew bêgav ma ku xwe bûka Baroz Paşayê
welatê Pêncşayê bide nasadin.

Tu nabêjî. Serbazirganî rind ew Paşa û welatê

wî dinasîn, gelek caran jî çûbû wir û tişt

kirrîbûn. Hem jî mêtantî û mêvanperweriya
xezûrê wê rind dizanibû. Ji ber hindê wî bi
çavekî din li Feyrûşayê nerî, pê re jî dilovanî û
mirovatiyeke merdane jê re pêşkêş kir:

- Rabe. Keça min. tu û lawikê xwe bi min re
werin. Ez ê hewe bibim mala xwe. Kanê heta ku
deriyekî xêrê ji we re vedibe.

Serbazirganê dilovan. peyayê navsere. hem jî
rêwiyê col û şaristanan. Feyrûşaya dilbikul û
kurê wê birin li hêstirekê siwar kirin û bi xwe re
birin. çû. Gava giha malê. got jina xwe:

- Ev hîrmet xerîb e. Emaneta wê û xasma ya
kurê wê. Bila li vir bin, ka hetanî xwediyê wan
derket.

100

Bazirganiya welatê Rojhilatê ji aliyê devera
Rojavayê ve dihat û ber bi aliyê devera Rojhilatê
ve diçû. Her sal du caran di wê şeveriya çiyayên
rênedayî re dibihurî. Ji welatê xwe tiştên
xwarinê, yên raxistinê, dextl û qatix bi hêstiran
dibirin welatên Rojavayê û li wir difirotin. Di
vegerê de jî ji wan welatan, afirandeyên fabrîqe
û karxaneyan dikirrîn û dibirin li welatê xwe
difirotin. Çûn û hatina di navbera herdu
welatan de, tenê şeveriyeke di wî çiyayê asê de
hebû ku destûr dida rêwî û karwanan. Jixwe her

kesî, her karwan û bazirganan tiroş nedikir ku
wê rê ji xwe re bikirina devera pêveçûnê. Tenê

kesên jixwerazî,

mêrxasên

dilritil

û fêrisên

ppilikweqî bizav dikirin ku di wir re herin û

werin. Ji wir pê ve wekî din ne rê hebûn û ne jî

destûra çûnê ...

Karwanê Rojhilatê, mîna ku felekê ew Ji

Feyrûşayê re diyarî hinartibe wir ku lê rast

hatibû. Eger ne wisan bûya, kî çi dizane ka dê çi

bihatina serê wê û yê lawikê wê yê şîrnîj. Yanjî

wan dê xwe bikira heval û hogirên gur û hirçan û

bi wan re cîrantî bikirina. Lê ew jiyan û amanjî,

destûra

bi wî awayî ya biwarkirina

mirovan

nedida, xasma bo zarûkên şîrnîj. Jixwe Ji keça

girêl re hîç destûr nedida, lê dibû ku lawikê

şîrnîj li gorî şertên xwezayê bihatina

ragirtin.

Lê eger xwezayê bihiştina ku mak û sex1a xwe li

wê deverê bijiyana, dîsan jî wan ruyê deşt û

101

germiyanan

nedipejirand,

her
çolane
dê
perwerde bibûna.

De her çî be û bi çî jî bibe mal û sermiyan, li wir Feyrûşayê digel kurê xwe demeke dirêj man. Maliyên Serbazirganê dilovan êdî ne bi çavên mêvanan, lê bi çavên xwediye malê li wan dinerîn. Her çendî wisan bû jî, Lêwek mesela ku dibêjin: Ne welatê xelkê ji mirov re dibe welat, ne maka xelkê ji mirov re dibe mak û ne jî mala kesî dibe mîna mala mirov. Ji ber hindê Feyrûşayê pir mola zilamê xwe dikir, pir li kurê xwe yê bavnedîtî disêwirî û hertim bi ax û oxan re tûşê kûrahiya jiyana biyanistanê dibû, geh jî çavên xwe hey li hatina Gurgînê Paşê digerrandin. Lê pa Gurgînê reben li kur bû? Gelo ew di çî rewşê de bû, yan bi jiyane re çî berxwedan dikir? Yan jî ango di kêf û sefayê de jina xwe jibîr kiribû? Wê hîç pê nizanibû ku ew li kur e û di çî halî de dijî. Erê, ji ber kul û kesera Gurgînê ne şev şeva Feyrûşayê bû û ne jî roj roja wê bû. Lawikê piçûk hîç xema bavê xwe nedikir û ne jî mola xwe bi wî ve didehfand.

Ji ber ku ew hêj têne digiha ku bav çî ne, êşa wan çî ye. Lê jê re mesela dê ne wisan bû, hergav şîr ji pêşîra dê

vedixwar û gava birçî dibû çavan her lê ziloq
dikirin.

Kufikê şîrmij hinbihin

givrokî dibû,

gixegix pê diket û dest bi çûna bi çapelûkan kir.

102

Serbazirganê dilovan Feyrûşayê û kurê wê ji
çav nedikirin, timê li wan miqate bû; ka jina wî
jiwan zivêrî dike yan nake.

Demekê bala wî

kişand ku Feyrûşa ne xwarin dixwe, ne radikeve
û timî dizermihe.

- Keça min. Qey nebî jina min ji te re ne baş e,
ku tu wisa bê made yî"?"

- Na mam. Xwedê mala te ava bike. malxweya
te jî bo me pir çak e. Lê mala min heye. mêrê min
heye û ez nizanim li kur in. Ez divê herim.

- De bisekine, heta ku ez herim bazirganiyê. Ez
ê karibim xeberekê bigehînim mala xezûrê te, da
bi cayê te ve bîn.

Bi wê gotina Serbazirganî. tirpîniyeke zext ji
serdila Feyrûşayê hilat û xwe bi xwe ket
mabeyna pêl û serkêlên deryaya pixav û tirsê;
dibe ku hema bavê min jî pê bihise, li vir dê min
bide kuştin.

- Na mam. Ez tenê jî dikarim herim.

- Keça min. Wele neyî çak e ku jin-hîmet tenê

bikevin rê û dirban. Lê dîsan jî tu dizanî.

Serbazirganî

rabû

hespekî ji Feyrûşayê

re

hazir kir. Têra wê xwarin û ji kurê wê re jî çend
perçe kinc û pertal xistin xurcezîneke mezin û
avête paş zîn, kîsikek tije zêr kirin dayê û ew bi
rê kirin. Feyrûşa li hespê xwe yê rewan siwar bû.
kurê xwe danî ber xwe, ajot û berê xwe da felekê.
piştta xwe da oxirê û ber bi biriyeke nenas ve lezand.

103

beziya. Sofî rabû da pey û kevir avêtin hespê.

Hesp li kevirê litimî. haha ku jinik bikeve û
kurê wê pekiya. terayî erdê bû. Sofî jî rahişt
stûkurra lêwik û got:

- Heke tu peya nebî. ez ê niha serê kurê te jê
bikim.

- Soft eman! Zeman! Di bextê te û Xwedê de! Ma
tu dikî çi bikî?

- Ez divê ku bigehim mafê xwe.

Feyruşaye berê hespê xwe vegerand aliyê Soft û
hinekî jê dûr sekinî. pê ve ket hêvî û zariyan, da
ew lêwik bide wê. Lê bala xwe dayê ku çare nîne,
yan divê xwe carekê bi destên wî ve berde, yan jî
lêwik nadê. Piştî ku feyda hêvî û lavelavan

çikiya, ne bi dilekî eseh got:

- Tu serê wî jê kî jî, ez peya nabim.

-!!!

Erê "qismet" û "diyarî" jê re hatibûn,

Lêji bi

hiştê yan ji dogehê? Ji ber zilm û hovantiyê yan
ji felekê! Belê piştî ku Sofî bala xwe dayê ew ji
hespê xwe peya nabe, hema serê lêwik danî erdê,
nigekî xwe jî danî ser girmilkên wî. destekî xwe
avêt bi serî girt û bi destê din dasa dirrikan avête
stukkurrê,

li ber çavên dê serî jê kir. Gava

Feyruşayê dît ku xwîna sor ji gewriya kurê wê
fiştiqî. bala wê kete ser qîzantiya wê ya bi şansê
reş û ji xwe re ma sar û cemidî. hema ziloq bû û li
wê xwîna sor nerî, nerî piştî jî li şevên di koşka
xwe ya li giravê de ku digel Gurgînî buwartibûn
106

rainiya ii berê wê xweşî û şadîmaniya

ku ev

lêwik jê afirîbû hîn bêtir agirê kulê bi cerg It
hinavên wê ve hilbezandin. Geh axîn kir, gahî
na1iya û weylawayê li xwe dubare kirin. Hin
caran ji mîna ku ew rewş li ber çavên wê henek û
laqirdî bin, hîç baweriya wê nedihat ku êdî ew bê
kur e

ser devê riyeye nenas e. Hem jî li ba

ü li

zalimekî wisan bê wîdan e ku digel rihê Sipî, bi temenekî pîr dikare serê lawikekî çendmehî jê bike.

Hesp li rê diçû, lê her carê qasekî mîna ku Feyrûşayê bi kurê xwe şad dibe, xwe bi xwe xeber dida û pinepin ji devê wê dihilat. Yekcaran jî destên xwe bi ber zikê xwe ve dişidand, herwekî lêwik bi xwe ve dişidîne da qenim nekeve erdê. Û hin caran jî gava didît ku lawik ne li ber wê ye, dev bi girîneke şewatî dikir û ji xwe re dilorand, stêrkên

xwînê dibarandin

û porê tê1têlî

dikişand, berê hespê xwe vedigerand It bi umîda ku dê lawikji paş ve bê tl bigîje wê, bîstikekê radiwestiya.

Hespê rewan jî ji bona Feyrûşayê diponijî; hin caran serê xwe bilind dikir û dihîriya, ha te dît ku yekcaran firefir dikir

dibeziya, piştire dîsa

It

dihîriya, diqîriya ü dihîriya ... Lê wê 11 Zanibüku hesp jî, bi êş It kula wê re heval e It di nava xwe de xwîn vedireşe, bi seljêkirina lêwik pir diêşe It dizêvire. Wê guman dikir ku hesp birçî büye, lihn büye yan jî tenga wî şidiyayî ye. Erê her

107

çiqasî barê hespî hindik sivik jî bübû, Lê ew
heywanê kerr û lal jî bi zordariya Sofî pir zivêr
dibû ü xwinxwariya wilo di herb ü qaleyên giran
de ji nedîtibûn. Feyrûşayê ji derdê kurê xwe
nizanibü ku bi kur ve diçe, dê here kur fl wê
çewan bike, yan çi neke. Hema berê hespê
biketina kû, her bi wir ve dilezand.

Serê Feyrûşaya şînoyî di ber de bû, carekê
hema dît ku hespê wê kire firefir û sekinî, serê
xwe jî tîk hilda. Gava li pêşiya xwe nerî, dît ku va
du cendirme bi gema hespê wê girtine û her yekê
li aliyekî rawestiya ye. Herdu cendirme ji
delaliya wê re lal diman û şaqiz büne, hema
ziloq lî serçavê wê dinerin. Piştî wê peya kirin
ü xwe li dormedarê wê lefandin. Lê demek neçü,
herdu ji bona wê pevketin ü hahaye ku li hevüdu
bixin. Cendirmeyekî got: "Ev jinik ji min re ye."
Cendirmeyê din got: "Na, wele min pêşî wê dîtiye,
ji min re ye."

Werhasilê

kelam, herdu

li ser

jinikê ketin pêşîra hev, qirên kirin

ji êkdu re

ü

dest avêtin tivingan.

Feyrûşaya dilbikul, ji ber ku hêj di binê înga

(şoq) xwîna kurê xwe de bû ü mîna şiva nava avê
direhilî,

ne dikaribû bi peyatî bireviya da xwe ji
destên cendirmeyan xilas bikira, ne jî dikaribû
ku li hespê xwe siwar bibûna û bi çargaviya
simên hespê rewan xwe ji wan bifilitandina.
Were li wan ziloq ma û xwe bi xwe fikirî, ramiya;
hin caran zîrektî ji mêrantiyê çêtir e, ka îro ez
108

xwe bicerihînim. Eger ez tê de bi ser ketim, jixwe
baş e. Na eger na, jixwe li vir dê namûsa min
paymal bikin. Hem jî, elawekîl ji cendirmeyan
kert ii" mirov lî dinyayê nînin. Divê ku ez bi
awayekî hêsan xwe ji destên wan xilas bikim.
Ekene, tiştê ku Sofî nelur, ev dê bi min bikin.
<Jinikdi nava xeyl û xiyalan de bû, ha ku dît
herdu cendirme, her yekê xwe avête pişt
taldeyekî û lûla tivingên xwe ber êkdu ve dirêj
kirin. Çavekî wan bi namlûyê ve zeliqî, çavê din
b1 jinekê ve beziya û gefûgurr li hevüdu dan. Wî
got, de tetik bikşîne! Yê din got. na pêşî tu
bikşîne. da piştire ez te bikujim lt jinek ji min re
bimîne. Feyruşayê jî di şûna xwe de kumişî erdê
û hêvî dikir ku yek yekî bihingêvtina. Lewra
eger dijmin yek bûna, umîda ku çaqek lê bête
kirin derdiket holê Lê wê rind dizanibû, eger ji
yeki zêdetir bin, gelek in ü dikarin pir gelş ü dek

bînin serê tayê bitenê. Cendirmeyan zirt li
hevûdû gemî kirin, lê tetik li hevûdu nekişand in
û dixwestin ku bi wi hawayî dem bibihure
û
tarîtiya şevê rind xwe bera ser deverê bide, da
karibin
hetanî
sibehê lî zozanê pezneçêriyan
geşt û seyrana ezebtiyê bikin. Erê ew bawerî her
ji Feyrûşayê re zêdetir dibû û xemgîniya wê digel
dilşkestîtiyê jî pingar dida û hin caran gerîneka
gola hinavê xwîndar dikelîya. Geh xemgînî û
xemsarî, gahî bizav û tiroş xwe bi hevûdu re li
dilê wê lefandin. Paşepaşê
bi nihênî tiroşeke
109

zirp a bi mêrxastî xwe Lê hemwar kir û qêriya.
gote Uvingdaran:
- Îş. bi qirênê safî nabe. Ez ê di mabeyna we de
tişteki bikin.
Herdu cendirme bi wê gotinê ji xwe re sar man:
- Tu yê çî bikir
- Ez ê kevirekî dûr bavêjim. Kîji we pêşî çû wî
kevirî hanî ba min. ezjê re me.
- Birra?
- Erê!
Her yekê wan di dilê xwe de li sivikbûna xwe

sêwirîn. çelengî û beza xwe anîne ber çavan û bi
wê pêşniyarê dilşad bûn. Erê wan jî ew yek bo
xwe rast didêra û pê zû razî bûn. Feyrûşayê dema
dît ku ew bi wê yekê razî ne. îcar ji xwe re dest bi
ristina hin pîlan û dolaban kir û destê xwe avêt
bevşikekî pahn î piçûk ku bavêje. Cendirme jî ji
şûna xwe rabûn û tiving û kutilkên xwe tevek
avêtin

erdê.

kincên

qalind ji xwe kirin.

da

qenim karibin sivik bibezin û zû herin bevşikê
dûravêtî bînin ba wê. Feyrûşayê bi çelengî rabû
ser nigan. çend caran xwe li ser paniya nigê rastê
dormedar kir û heta ku birî di milên wê de hebû
bi destê rastê ew bevşik avêt. Bevşik bi pêlên
bayê re xwarovîçko bû û berepêş beziya. çû kete
newaleke

kûr û di nava dahlekê

de nixumî.

Herdu cendirme jî ji şûna xwe terqizîn. bi beza
nigan. mîna gurên sibatê bi çargavî beziyan. çûn
ketin kûrayîya newalê. Îcar dem ji Feyrûşayê re
110

bû dem û dewran, roja wê bû gulîstan, firset û
mecal bo wê hatin qadê û rahişt çek û berikên

wan, li hespê xwe yê rewan siwar bû û panî dayê,
hespê xwe ajot. Lê bi çi ajotinê! Qey mirov digot,
Berhîm Pêxember e û ji ber Nemrûdê Çiyayî
direve, gava ku berê xwe dabû çola sîlekan û
diçû. Beza hespê rewan gelî û newalan yekere
dikir û dev bi firefireke wisan kiribû, ku xwe ji
çûk û teyrên li asmên şûnde nedihêla. Herwekî
wî jî meselê dizaniya ku kêr gihaye hestî û nema
li ber

êdî siwara

lê kare

hewqas

zorî

û

xwînxwariyan debar bike. Ha bi wê bez û şêlê, wî
qonaxa du roj an di nîv danî de buhart û xwe
gihande hafa bajarê mezî. Li wir êdî tewrê
rêveçûna xwe guhart, dest bi meşa sistgavê kir û
ber bi bajarê şên ve meşiya.

Bajarê Bejmêrsitanê, pa tu çi bajar î. Hema
bila mala xwediyên te ava be û tu her lijiyanê bî.

Ne serê wî dihate dîtin û ne jî kêlek û dawî... Tê
de avayîne rengareng ên wisa bilind hebûn ku
xwe reqaftibûne

êkdû û ji ewran re kêmanî

nedikişandin. Bi her awayên xwe, ew mîna ku ji
biyaniyan

re her dikeniya û destê dostaniyê

dirêjî wan dikir.

Berî ketina nava bajêr, Feyrûşayê xwe bi xwe

got: Ez bi vê bedewtiya xwe, bi vê kêlsim û

gewretiya hanê

herim kur jî, wê hin sofî û

cendirmene bîjî min nerihet bikin û kula xwîna

kurê min bînitin pêşberî çavên xwîndar. Lê ka ez

1 11

çi bikim, çi nekim, divê ku ez xwe renggêrran

bikim. da kes nizanibe ku ez jin û himiet im.

Îcar li wir porê xwe yê zêrînî da ber meqesê, serê

xwe rût-zelût kir û bedlek kincên zilaman li bejn

û bala xwe rapêça. Kolosekî Serhedî danî ser

kumbeta qoqê xwe û navê xwe jî guhart, danî

Feylezûr. Feylezûr piştî dev pê kir û navê xwe yê

nû dubare kir. xwe bi xwe got û got, heta ku rind

rewa kir, da qenim navê xwe jibîr meke. Hêdîka

hespê xwe ajot û çû. rast berê xwe da xanekê.

Mamoyê Xerat. piştî kêmketina ji herdu

çavan, îcar ji xwe re xanekê vekiribû û pê debara

xwe dimeşand. Dema Feyrûşayê nerî ku va

zilamekî kal li ber xanê ye, hespê xwe û herdu

tivingan teslîmê wî kirin û got:

- Kalo. Ev hespê min û herdu tiving bila li cem

te bin. Heta heftiyekê eger ez hatim, jixwe ez

heqê te didim, wan digirim û diçim. Lê eger ez

nehatim, bila hesp jî, herdu tiving jî ji te re bin.

- Ê de baş e. lawo! Wey Xwedê te hezarsa1ê bike.
Kurê min, ev çiqas bazara te xweş e!
Feylezûrê xemgîn berê xwe da nava bajêr û çû
ji xwe re li çarsuyê
geriya, hinekî bihna xwe
deranî, piştire çû dikanekê da ji xwe re hin tiş
bikirre. Kalê hinhizî yê xwediyê dikanê gava çav
pê ket. wisan jê re kêfdar bû herwekî ew deh sal
bin wî dinase û pê re têkilî kiribin. Ji şûna xwe
rabû û ber pê ve çû:
- Xortê delaL. Navê te bixêr?

112

- Feylezûr, Xwedê xêra xwe li te bike
- Lawo. Wele pir kêfa min ji te re hat. Ka were
qasekî li ba kalê xwe rûne û em bi hevûdu re
qahweyekê vexwin.
Feylezûrî nana nekir, ew û kalo xwe dane ser
kursiyan,
dev bi xeberdanê kirin û her lê
domandin. De yekji virê, na yekji wirê, lê kalo
hey ew bereçav dikir û şêl û tevdîra
libat û
axaftina
wî di nava
dilê xwe de diteqiland,
zêdetir jî li terbiye û awayê axaftina wî disêwirî.
Erê piştire ew giha wê baweriyê ku ev xort pir hay

ji xwe heye û kesekî dinyadîtî yê serwext û zana ye, hem jî bi tore û terbiya malbateke xwenas gihaye mezinatîyê. Êdî ji kalo re kew hatibû ser hebikê, baz ketibû xefikê û dilê xwe lê yekbar kir, ku wî bike lawê xwe. Di wê navê re qasekî xweş bihurî, êdî wî hew semax kir û hêj fîncên vala li ber wan bûn, bi peyveke mîna şîr û hingiv got:

- Niha tu nabî kurê min, ez jî bavê te? Jixwe min tu jin û zarû nînin! Ezî kundûrde me û pir jî dewlemend im. Îro, sibe gava ez bimrim, wê ev mal û serweta min tev mîrate bimîne. Hîç nebe, tu yê warê min şên bihêlî û deriyê mala min bi te vekirî dimîne. Ewçax ez jî di gora xwe ya li goristanê de dilxwş û şadan dibim.

Feylezûr serê xwe daxist erdê û li demçûya xwe fikirî; dema keçantiya xwe anî ber çavan ku bi zorê bav wê dida kurê birayê xwe û wê nedivabû.

113

Piştî sirgûna li giravê û hevdîtina bi Gurgîne Paşê re ... Lê xwîna gewriya kurê wê tîneke germtir êxiste nava hinavan û çend dilop stêrk ji çavên belek barandin erdê. Jixwe hovîtiya cendirmeyan hêj mîna nanekî germ li ser çokan dihişt. Paşepaşê xwe bi xwe got: Madem ku ev fîrset laqî min hatiye, divê ku ez mîna dûvê masî

ji destên xwe bernedim. Da piştire xwînxwariya
poşmaniyê min neqermitîne û dilêşanî jî min
nehingêve:

- Çima ana! Jixwe kesekî minjî tune.

Erê. rast e ku xwediyê dikanê bê teled î weled
bû û bi tena serê xwe dima. Kêfa Kalo pir bi
gotina erêniya Feylezûrî hat, ku bi gotinekê xwe
kire kurçirkê wî. Îcar Feylezûr li cem kalo ma
hetanî êvarê. piştire wî ew bi xwe re bir û herdu
çûn malê. Roja din sibehê herdu rabûn û dîsa
hatin ber dikanê. Ha wisan êdî her roj sibe zû
herdu bi hev re dihatin ber dikanê û êvaran jî
diçûn malê. Îcar ji roja ku Feylezûr kete ber
dikana Kalo. ji kinarê Yezdanî ve berê xelkê wî
bajêrî jî vegeriya ser dikana wî û tişt jê kurrîn.
kurrîn heta salek bihurî. Kalo bû zengînê bajêr
yê herî bangor.

Kaloyê dikandarî

êdî ji çapa xwe daketibû,

nikaribû zêde here ber dikanê û were. Wî dikana
xwe bi tamamî sparte Feylezûrî. Lê her ku çû
Kalo ji taqeta xwe biriya: çavên wî kwîr bûn, ji
herdu jnuyan daket. nexweşîne xwe lê geş û şên

114

kir

rojekê hema got "zirp" û ji nişka ve mir.

û

Îcar ew mal û serweta wî tev, ew xanî û milk, ew bax û bostan, zevî û daristan hemû ji Feylezûrî re arinzî man. Feylezûr bi wî temenê xwe yê ciwan, bi wê delalî û "xortani"ya xwe ya bişadan di nava dewlemendên bajarê Bejmêrsitanê de cihê xwe vegirt û di welêt de zengînê yekemîn hate pejirandin. Dewlemendên bajêr jî gelekî jê hes kirin û fersendê dane wî ku ew ticareta xwe berfirehtir bike û bazirganiya xwe bi welat û şaristanan ve bişîne.

Paşayê bajarê Bejmêrsitanê Tiroşzade gelekî rind bala xwe dida ser aboriya welêt. Hertim wî dixwest ku dewlemendên bajêr zahf bibin û dewlemendiya wan zêdetir bibe. Ew, herdem ji bazirganiyê re jî dibû alîkar û îmkanine rind bo bazirganan rêser dikirin; gelekî karxane û fabrîqe ji kîsî dewletê dabûne vekirin û xelkê xwe betal nedihîşt. Timî bi dewlemend û

maldaran
re civînine
taybetî
dikirin
û ew

teşwîqê dewlemendiya miştir dikir; pesnê wan dida, diyarî li wan belav dikir û di nava wan de komele û sazgeh dida damezirandin. Her wisan zêde ji wan baca dewletê jî nedistand. Tiştê ku distend jî pê dibistan, xwendegeh, nexweşxane, rê, bo desttengan avayî didane çêkirin.

Ji
ve jî bala
alîyekî
Paşê
rind
kişiyabû
ser
115

Feylezûrê Bazirgan û hîç ew ji çavan dûr nedikir. Tiroşzade Paşa rojekê bi hemû dewlemend û bazirganên welatê xwe re, civîneke taybetî çêkir. Gelek kesên pişdarên babetê, beşdarê civînê bûn. Piştî axaftin û galegalên li ser meselê û dana pesn û payedariya dewlemendan ji aliyê Paşê ve,

dor hate ser dabeşkirina perû û diyariyan. Wî,
gelek perû û diyarîne xisûsî pêşkêşê wan kirin.
Xasma Feylezûr. Hem jî Paşê bi peyvîne xweş jê
re spasî kîr, pir kêfa xwe lê honand
û ew
vexwende cîgeha payedariyê:
- Îro gelşa herî girîng bo jiyana mirovan, aborî
ye. Dema aboriya welatekî mişt bibe, ew welat
dikare
her tiştî
bike. Dikare
alîkariya
hemwelatîyên xwe bike, gelşên wan çareser bike
û ew ji jarîtiyê rizgar bike. Lê eger ne wisan be,
hemwelatî destteng dibin, di nava wan de xirabî
zêde dibe û hizûra xelkê namîne. Ji ber hindê
Feylezûr bi vî temenê xwe yê kêr, bi vî rewşa
xwe ya genc ku xwe ji hemtayên xwe bihurandiye
û her sal jimareke pir zêde dirav baca dewletê,
hemkûf û babetê perûkirineke bêqam e.
Û piştî Tiroşzade Paşa neynikeke cîhanbînî
ji çeltikê xwe deranî û ew jî diyarî da Feylezûrî.
Bi dana neynikê re, dewlemendên bajêr tev bi
derbekê, jê re çepik lêxistin û dengê hêlan û
qîreqîra bi gotina "her bijî" weke brûska meha
nîsanê dengvedêrî kir, heta ku şemata wan zorî

116

da taqê jorîn ê serayê. Pêre jî kêf û şahiya wan
giha seretaya asîmanê banî; bû reqereqa fincan
û şûşeyên bade û meya engûrî êkdu hingavtin. bi
gotina noşenoşê û bi peyv û bêjeyên xweşber re
govenda dilê dilşkestiyan dest bi tazetiya jiyane
kir. Piştî ew dewlemend jî tev bi hevûdu re
rabûn û her yekê wan diyariyeke bi nîrx pêşkêşê
wî kirin. ta ku wî di nava xelat û peruwan de
nixumandin.

Erê her çendî ku Feyrûşa bedilandî bû jî. reng
û k.êlsima wê gêrrabû ser tewr û awayekî din ve û
navekî zilaman lê danişiyabû. hem jî li bajarê
Bejmêrsitanê bûbû dewlemendê herî mezin û ji
Troşzade Paşayî diyarîne nîrxdar wergirtibûn û
gelek jî ji dewlemendên
bajêr ... Lê ne kula
jêkirina
serê kurê wê jibîr
diçû. ne ji derdê
wendabûna mêrê wê dilhêsanî didanê û ne jî ew
hovîtiya herdu
cendirmeyan
ji ber çavên wê
wenda dibû. Ha bi wan derd. kul û xeman ve
Feylezûrî li dewlemendiya xwe ya sereke domand
û xwe tûşî nava kêl û xêza bajarvanîyêkir.

Di wê navê re gelek roj bihurîn.

hewqasî
zêdetir heftî li dê hevûdu beziyan. mehan êkdu
li hev lefiyan û
hingavtin. sal mîna bablîsokê
Feylezûrî jî her wisan karê bazirganiya
xwe
berepêş xist; kirrîn û firotina xwe zêdetir kir û
117

dewlemendiyê
li xwe
dubare
gihande
têra
serqûçkirinê. Lê ew hêj di karûbarê sêbarekirîna
dewlemendiyê de ditûşiya, rojekê hema ji nedî ve
dît ku dengê mirina Tiroşzade Paşayê bajarê
Bejmêrsitanê belavbû. Û pêre, pêre şîneke giran
xwe bera ser xelkê da: alayê daxistin nêvî,
dikandarî û bazirganên bangor tevek rabûn
deriyên dikan, biro, karxane û kargehên xwe
radan. Her kesî di tangava xwe de dev bi girînê
kir û lorikên şîniyê baradirin.
Erê, her kesî dizanibû jî ku tu çare bo mirinê
nayê dîtin û hetanî wê gavê jî nehatiye peydaki-
rin. Eger çare hebûna, wê ji Tiroşzadeyî re
bihatina kirin. Çare nîne, feyde nîne û tu tişt
nînin. Lewra eger hebûna, diviya ku wî ew şerbet

venexwarina. Divê her kes wê şerbeta mergê
vexwe û bitamijîne ka çewan e. Şîn û girîna bo
miriyan jî feyde nade. Eger zindî hertim bi şîna
miriyan re bilipikin, xisareteke mezin tê ser
wan
û valahiya
wê xisaretê
zûbizû
nayête
dagirtin. Tiştê girîng ewe, ku zindî miriyên xwe
yên wefadar jibîr nebin û xwe bi wan serbilind
bikin,
ku ew bûne
xwediyê kesên wisa yên
dilovan î fedakar. Bêguman e jî. eger mirov 11
miriyên xwe yên kevnare nepirse û li wan xwedî
dernekeve.
mirov beyana kêmcibiliyet
û nija-
diya heyî dadixîne jêrê û rûmet û birûmetiyê.
bêavrû
û kesatiya
xwe bêbiha
dike û erzan
dihêle. Ji ber wan xeysetên çak û merdane yên
118

Paşê, îcar bajarvaniyê n bajarê

Bejmêrsitanê

çiqasî zêde ji Paşayê xwe re bigiriyana, bo wî şîn
bikiina ne zêde bû, Lêbelkî hêj kêmtir û kêmtir bû jî.

Piştî bidawîhatina şîna Tiroşzade Paşayî bi
çend rojan. diviya ku paşayekî nû bihatina
hilbijartin. Erê roj hatibû serbiserê û dest pê
kirin. Îcar di rojê hênikayiya êvareke zelal
de. bi fermana serokê giştî yê parastina welêt.
delêlî bo eşkerekirina berendametiya paşatiyê
ketin nava bajêr û bû qîr û qiyameta wan:

- Hayhêêê! Bila kes nebêje min seh nekiriye.
haaa! Filan rojê. li Meydana Azadiyê, wê teyrê
dewletê berdine firrêêê. Îcar Teyrê Dewletê eger
here li ser serê kî danîşe. ew kes dibe paşayê
dewletêêê ...

Xelk ber bi Meydana Azadiyê ve kişiya û mîna
lehiyê çû; jin û mêr digel xort û keçan tevî kal,
pîr. dewlemend. oldar û gebar ... Çi kesên ew deng
seh kir û neki. hemû ji mala xwe. ji ciyê kar û îşê
xwe rabû û ber bi meydanê ve beziya. Pêlên goşt û
xwîna ganiyan çelq li ser çelqê hilavêtin û bû
xurmîn û gurmîna defê. bû lorîn û zûrîna bilûrê.
bû çîzeçîz û xîzexîra zirnê. bû şeşeşeq û pivepiva
tenbûrê.

Heytehola

heyî digel qorên govenda

sêpê tew li xwe alifandin û di destên keç û lawan
de mendîl ên keskesorzerî hatin libakirin.

Erê ew roj şahî bû. Li wî welatî li dû her şîne
şahî çêdibû. Netenê bo kifşkirina Paşakî nû, erê
li dû her şîneke wisan welê dihate kirin. Lê jixwe
119

ev şahî. bo kifşkirina tişteki taybetî. hem jî pir
pêwîst bû. Di nava koma sereke de. gelek kesên
xuyanî, yê dewlemend û xwedîşan cihê xwe
girtin û bi umida danişandina Teyrê Dewletê li
ser serê wan, hêviya xwe rind dewisandin û çav li
firê ziloq kirin.

Ew koma giregiran

gelekî

bala

Feylezûrî

kişande ser xwe. Hema ew jî rabû. xwe ber pê ve
kişand û çû nêzî komê. temaşeyî wan kir. Bi
teqandina topa aştiyê re gava ku Teyrê Dewletê
yê perwerdekirî li hewa perr û baskên xwe
leqandin û fir li xwe dan. çend caran li ser serê
xelkê çû-hat. çû-hat û çû. dûr çû û nêzîk hat. dûr
bû û dîsa vegeyriya. hema carekê ji nişka ve xwe
fiti1and û çû li ser serê Feylezûrê biyanî danişî.
De îcar bila kevir û kuç li Sofî û herdu
cendirmeyan bibarin. xêr û xweşî jî li Feylezûr
bariyan. Xelkê Jê re çepik lê xistin. piştê ew
danîn ser milên xwe û birin serayê. li ser kursiyê
paşatiyê rûniyandin; kincên paşatiyê lê kirin.

taca dewletê danîn ser qoqê serî û li pêşberî wî
merasima
serbazên
taybetî
dane bestekirin.
Piştire hemû serdar û hîmdarên
dewletê. digel
dewlemend û xuyanîyên bajêr tev. çûn Paşayê nû
pîroz kirin û jê re dirustiya xwe dane diyarkirin.
Erê. pêşiyên me dibêjin ku: "Dinya dem e. geh
petêx e. gahî lem e." Dem û dewrana
lemê
bihurîbû
û dor hatibû ser petêxê. Êdî Feylezûr
Paşa dest bi karê paşatiya xwe kir. Pêşî li her
120

deverê komikine alecî dane damezirandin û
ragirtina herêmokan xiste destên wan. Piştire
komikine herêmî damezirandin. îcar ji hemû
komikan. encûmenekê damezirand. Ha bi wî
hawayî çî gelş û nexweşî hebûna. pir zû çareser
dikirin û daxwazine nû jî pêre. pêre bi cih
dihanîn. Bi wan tewr û livakan. Paşê ji xelkê
bajarê Bejmêrsitanê re karekî wisan hêja kir.
ku her kesî xwîna her çar qulçavkên dilê xwe jê
re rewa dihişt.
Lê her çiqasî Feylezûrê Paşa xwe rengdêrê bi

şûfê zilaman kiribû û paşatî dikir. lê ne mêrê
xwe Gurgîn jibîr dikir. ne kula Sofiyê ku serê
kurê lawik jê kiribû ji dil derdiket û ne jî êşa
herdu cendirmeyên ku ew di rê de kepaze kiribûn
ji nava hinavan
derdixist. Tim û daîm li ser
kursiyê
paşatiyê
difikirî,
diramiya
û gelek
dihinzirî. xwe bi xwe digot: Ez çi bikim. çi
nekim. ez ê çewa karibin nava xwe hênik bikim
û bigîjim miraz û mexsedên xwe? Lê wê bi xwe jî
nizanibû ka dê çi bike, yan çewan dikare bigîje
amaca xwe. Jixwe hîç nikaribû
derê sindoqa
derdan ji kesî re jî vekira. Hertim serpêhatiya
xwe bi nihênî digirt. da kes pê nehise û di
hindiruyê xwe de her dikeliya, diwerpixî û
dibeecî. Lê dixwest ku bo xwe aqilekî nûjen
biafirîne. fikr û ramanin nûtir derxîne holê û
rêşopeke serdest bibîne, da li serê here û were ku
karibe
xwe bigehîne binê siya dara mirovên
121

dilşikestî. Îcar di nava hewqas xewn û ramanên

kûr ên bêqam de. carekê ji nedî ve Kaniya
Rêwîyan hate bîrê û li serê fikirî.
Kaniya Rêwîyan. kaniyeke pir xweş î delal bû
û aveke zelal jê dadiweribî. Kaniyê rengê xwe bi
tîrêjê rojê diguhart û her diîsand. diÇilwilî û
xwe dirêjî nava dilê lêvqermiçyan dikir. Kaniya
xweş û delal. xwe li serê sêriyaneke li keviya
bajarê Bejmêrsitanê bi cih kiribû. Çiqas rêwî û
rêbiwar. bazirgan û karwanên herêmên her heft
beşên bejê. tev dihatin û di ser re dibihurîn.
Kijanên gava dihatin di ser re dibihurin jî. pêşî
diçûne serê. têr av vedixwarin û sewîl û kunên
xwe tije av dikirin û hêj li riya xwe didomandin.
Feylezûr Paşa gava çû serdana kaniyê û çend
caran li dorê geivedor bû. xwe bi xwe got: Eger ne
ev kanî min bigehîne mirazê min. tu tişt bo min
nabe
alîkar û ji dermê min re nabe derman. Îcar
ez ê tişteki wisa li ser vê kaniyê çêbikim. ku
derdê min pê bi derman bibe. Eger ne wisan be. ez
ê rojek ji rojan dê ji vî derdê xwe bêjim tereq û
bimrim.
Hema pêre. pêre Paşê ferman da wezaretê Av û
Avdaniyê.
da zû, rojek
berî rojekê.
Kaniya
Rêwîyan çêbike û li keviyê xaniyekî tekûz ava

bike. ji bo ku rêwî lê bihêwirin.

bihna

xwe

berdin û runin xwarina xwe bixwin. Li aliyekê jê
lewheyêke îlanan vegirin da nexşîne, belavok û
agahndariyên

di layê rê û welatan

de pê ve

122

daleqînin. Piştî ew ferman giha berpirsyaran.

di

demekurtekê de bi cih hat. Feylezûr Paşa jê
wêneyekê xwe yê bi kincên jinan. bir li lewheyê
daleqand û çedn serbaz danîn berê. got:

- Çi rêwiyê ku hate ser kaniyê. eger çû li vî
wêneyê meyizand û keser kişand. an xwe bi xwe
tiştêkê got. hema bigrin û bînin cem min.

- II!

Karwanên

bazirganiya

piraniya

welatên

dinyayê û rêwiyên herêma bi navûnîşan her roj.
hergav û her saet ji rê ve dihatin û di ser kaniya
li berê bajêr de dibihurîn û bi welat û şaristanan
ve diçûn. Yê ku ji rê ve dihatin. pêşî diçûne ser
kaniyê. têr ava hênik vedixwarin. piştê diçûn li

wî xaniyê xweş rûdiniştin
û xwarina xwe
dixwarin.
bihna
xwe derdixistin
û hinek jî
yekcaran ji xwe re li wir radiketin.
Lê zêdetir
bala kesî nedikete ser wêneyê jinika bedewa ku
bi lewhê ve daleqandî bû. Ha bi wî awayî gelek
roj û heftî xwe li pey êkdu kudandin
û bi
helebezeke rewan ve berepêş beziyan. Rojek ji
rojan serbazên nobetvanên wêne. ha dîtin ku wa
sofiyekî perpî hate ser kaniyê. pêşî tê av vexwar
û piştî çû liwan der û doran geriya û temaşe kir.
Dema çavên Sofî bi wêne ketin. çû nêz û li berê
sekinî. bibalkêşiyê bêtîdar wilo Lênerî. piştî
diranên xwe sîqirandin û devê xwe li hevûdu
xist. mirûzê xwe tirş kir û mîna ku pê dijûn bike
hûrik-hûrik
di ber xwe de peyivî. Serbazên
123

nobetdar bi bez çûn û bi milên Sofî girtin. Lê Sofî
xwe di nava lepên wan de circirand û herdu nigên
xwe kutane erdê, neçû. Lê mîna ku xilasiya Sofî
nebû, hema serbazan ew bi erdê ve kişandin û

birin serayê, xeber dane Paşê ku va wan sofiyekî
aniye.

Gava Paşê Sofî dît, pêre pêre jêkirina

serê

kurikê şîrm1j hate ber çavan û pêlên kela dilê
xemgîn fûriyan, herdu çav lê tarî bûn, dinya li
dorê geriya û gote serbazan:

- Sofî bibin têxin zîndana binê girtîgehê. Her
roj keriyek nanê ceh û tasek ava germ bidinê.

Piştî zîndankirina

Sofî bi çend rojan, îcar

rojekê serbazên nobetvanî dîtin ku wa du zilam
hatin ser kaniyê û av vexwarin, piştî çûn li ber
wêneyê daleqandî sekinîn û xwe bi xwe peyivîn,
her yekê wan axîneke kûr ji nava hinavan kişan
û ponijîn. Serbazan ew herdu jî girtin û birin
serayê. Dema Paşê ew dîtin, bala xwe dayê ku ew
herdu cendirmeyên di rê de ku ketibûn pêşiyê ne.
Erê wan cendirmeyan lê doza namûsê kiribû, wê
jî dek li wan honandibû

û bevşikekî

pahn

<!vêtibûnewalê, da kîji wan zû here û pêşî bevş1k
werîne cem, ango ew jê re ye. Îcar dema cendirme
li dû bevşikî çûne nava newalê, berî hatina wan,
wê tivingên wan jî hildane û bi beza hespê xwe ji
lepê wan xilas kiriye. Paşe xwebixwe fikirî û di
dilê xwe de got:

Ez çi ji van bikim, çi nekim?

Piştire got serbazan:

124

- Van herdu zilaman bibin têxin girtîgehê. bila di nava girtiyan de bin û weke girtiyan xwarin bixwin.

Her ku diçû. dilê Feylezûr Paşa dikete cih. umîda gihandina mêrê wê Gurgîn jî jê re zêdetir çêdibû. Lê bajarvaniyan û endamên encûmenê ew nerihet dikirin û rorî didanê da bizewice û bibe xwedîjin. Paşe jî nikaribû bigota. ku ew bi xwe jin e û mêrê wê jî heye. Û kula mêrê xwe hîç jibîr nedikir.

Lê hindik be jî ya kurê xwe yê seijêkirî ji bîra xwe hîç dibir. Hinbihin nepxa xewta dilê Paşê dadiket. Lê gelo Gurgîn li kur bû. çi dikir. di çi rewşê de bû. ne Paşê dinizanibû û ne jî ageh jê hebû.

Ha wisan ew kete derdê

Gurgînê û li raman û samanan domand.

Erê Gurgîno belengazo. perîşano. şerpezeyo. hêsîro. birçiyoy. tazîyo û jirêketyo. Tu lawê paşan bûyî. tu gula civatan bûyî. tu dermanê dilê zeriyan bûyî. tu ji dê û bavê xwe re keda gelek salan bûyî. Lê niha tu bûyî reben û hêsîr. birçî û tazî mayî. bi rê û dirban ketî. hema li çarnika1ê dinyê digerî. Erê gera te ne lihaş bû. li jina xwe

ya bizarû digeriyayî. Lê feleka malikwêran agirê
kulê bera firfiroka te dabû û te ji asîmanekî
bilind
daxistibû
ser
serê
çiyayekî
bilind
ê

xiruxalî. ku her der û dever dar û bi daristan
bûn. hemû gelî û zinar bûn; lê ne re hebûn û ne jî
şeverî. Lêbelê tu bi sond û selewat bûyî. ew soz û
peymanana di şeva marberrînê
de ku te dabûne

125

Feyruşayê. hêj di nava lêvên te de dubare dibûn û
ew ger û dewran jî tev bo gihandina wê yekê
derkettbûne serseda cotê te. Ka bêje Gurgînê dilê
diya xwe. kezeba hinavê bavê xwe. Hewqas sal û
zeman tu li kur mayî. li çend welat û şaristanan
geriyayî? Erê te bi xwe jî nikaribû bersîva wan
pirsa bidana. Ji ber ku deverek nemabû ku tu lê
negeriyabûyî. Çiyayek nemabû ku tu neçûbûyî
li jina xwe ya
hafê û te xwe negihandibûyê.
nexweş negenyabûyî. Îcar te niha di wê gera xwe
de hîç bawer nedikir û umîda gihandina wê jî bo

te nemabû. ku careke din tu dê wê bibînî û dest bi
jiyaneke mîna ya berê. lê ne bi dizî îcar eşkere
bikî.

Gurgînê belengaz ê ku lê ne kinc mabûn.

di

n1gan de ne pêlav mabûn. birçî û belengaz bûbû.
hem jî stûxwar û jar ku tenê hestî û çerm lê
mabûn. gava di çiyayekî bilind re derket banî. ji
dûr ve çavên wî li bajarekî ketin. Erê. li dinyayê
tenê ew bajar maye ku ez neçûme navê û li jina
xwe negeriyame I Hema dev ji axaftinê berda û
berê xwe bejêr kir û lezand. li perê bajêr giha ber
kaniyekê.

Pêşî çû têr

ava hênik

vexwar

û

vegeriya kir ku here. çavên wî li wêneyekî ketin.
Bi dîtina wêneyî re. ttrpînî ji serdila wî hilat û
bala xwe pir kişiya serê. xwe bi xwe got: Gelo ev
ne wêneyê jina min be? Hêdîka çû li berê sekinî.

Gava

serbazên

nobetvanî

dîtin

ku

zilamê

perpisokî. kinchizhiziyê tîştîşî û hem jî pêxwasê

deqeşeqî yê bêmirûz hem jî piştixwarê qilûz ku tenê çerm û hestî Lêmane. çû li ber siya lewheyê sekinî û ziloq bû li wêne nerî. piştire ji kûrayiya hinavên xwe axînekê kişand. bi bez çûn bi milên wî girtin û ew birin cem Paşê. Gurginê jar qenim nikaribû ku xwe di nava lepên wan de bicircirîne jî. Û xwe bi xwe got: Ha ji xwe ev ji min kê mabû! De bila min bavêjin hevsekê jî~ da qenim ez ji vî ezyetê zor rizgar bibim.

Dema Feylezûr Paşa çav pê ket pêre. pêre ew nasî ku Gurgin bi xwe ye. Lê belengazê reben wisa rind mest bûye. qels û jar bûye. dexdexî bûye û ji şûfê mirovan derketiye. ketiye şûfekî din ê nenas. Erê dilê birîndar hingê ji lawikê seijêkirî zêdetir pê êşiya:

- Vî zilamî bibin girtîgehê û têxin odeyeke taybetî. her roj jê re tûtikekê biqelînin. xwarinên xweş bidinê. ka heta hinekî bi xwe ve hat. piştire ez ê pê re bipeyivim.

Sofiyê rihdirêj. herdu cendirmeyên hêkxwur û Gurginê lawê Baroz Paşa. di Girtîgeha Mirîxwurê de man û ketin tavila rihê xwe. Lewra wan. ne sedemê girtina xwe dizanibû û ne jî gumana tiştêkî wisan dikirin ku dê ew nava girtîgehê bipîvin. Lê te dît dibêjin ku mirov nizane wê kengê û çewa bimre. Ekene. dê her kesî bi destên

xwe goreke rind ji xwe re çêbikira û li pawuka
peyayê qolfelekê bimana. ta ku rojbaşiya dawîn
lê bida. Ha wisan ew girtî her di girtîgeha xwe de
127

man. Feylezûr Paşa jî li paşatiya xwe domand.
Lê Paşe êdî dilxweş bû, bi şadî û şadan dibû û
bawer nedikir ku Gurgîn zû were ser hemdê xwe
da wî zû bîne malê û ji nû ve dest bi jiyaneke
nûmalî bikira. Bi wî hawayî çû zeman, hat
zeman, êdî li cem Paşê ne semax ma û ne jî debar.
Rojekê gazî berpirsyarê girtîgehê kir:

- Here wî Sofiyê ku di zîndanê de ye bîne vir.

Berpirsyarê

hevsê çend serbazên

çavsor

daxistin zîndanê. Ew çûn, bi milên Sofî girtin û
wî birin serayê. Paşê gava li Sofî nerî. erê dît ku
Sofî jar bûye, muyên rihê wî tev kurr1sîne, çavên
wî di kûr de çûne û mîna roviyê sibatê lê hatiye,
tenê maye çerm û hestî. Lê seijêkir1na kurê xwe
yê şîrmij jî jibîr nedikir û fermana wî ya taybetî
nivîsand

ku. vî Sof1yî serê zarûkekî

piçûk bi

dasa dirriyan jê kiriye. Kaxezê fermanê xistin
stuyê

Sofî û ew birin

cem serbirran.

Piştî

bicîhênana

fermanê,

Paşê

gote berpirsyarê

girtigehê:

- Wan herdu zîlamên dinji min re werîne.

Dema serbaz çûn ew herdu cendirme

anîne

cem Paşê. Paşe li wan û bêaqiliya wan a bi

cendtrmektî

fikirî, serbaztiya wan anî ber çavên

xwe û xwe bi xwe got: Cendirme li her deverê e:ynî

guhdirêjn in, gotinên wan jî gir in, lê dûv ji wan

kêm e. Ne lihaş ji wan re gotine

hêkxwir.

tûtikxwir û devleq. Îcar Paşê ezebtîya wan da ber

çavan û herdu rizgar kirin. Piştî dîsa gazî

128

berpirsyarê hevsê kir:

- Vêca here, wî zîlamê bitenê werîne vir.

Berpirsyar û çend serbazên helegur bi lez û bez

çûn hevsê û Gurgînî ji oda taybetî derxistin, ew

birin cem Paşê xwe. Dema Paşe çav pê ket. bala

xwe dayê ku ew çerm û hestî li hev rênîştine û

xwe berfireh kirine. ew bejna narîn a zirav qenc

ragihaye. soresor ji ruyê wî diçe. stûkurr lê
qalind bûye û têr rind qebilî ye; çirçên ruyê wî
tije bûne û xebxeb Lêdakiye jêrê.

Erê ewçax hema ji nedî ve evîna li giravê hate ber çavên
Paşê û kela vînê fûriya. bengîtiya nihênî ya li
koşkê bi derbekê bûn mîna şerîdekê û li pêşberî
herdu çavanên êşmend reqisî. Geh kela dilê
melûl rabû pêta evînê. gahî êşandeya
xwînê dakete qulçavkên jêrê. Geh. geh di dilê xwe de
giriya û hin caran jî kenîya. Lê kula cudatiya jê
bi hewqas salên dirêj jî dil lê pir arandibû, bezz
lê guhartibû û hertim xwe bi umîda belkiyan
diwerdipixand. da rojek hebe ku careke din dîsa
bigîjê û ji nû ve hêlînekê bo xwe ava bike. Yan
carekê bi şadanî malxweya wî jê re bigota mêro û
wî jî jê re bigota jinê ... Ew roj û şevên êşdar hatibûne ber deriyê
bêumîdiyan
û serbiser bêdera xwe qûçandibû.
Berpîrsyar, serbaz û parêzgehên taybetê hemû şûnde bezîn derve û
Gurgînî li cem xwe da rûniştandin
heta ku bû êvar û ew bi xwe re bir hêlîna paşatîyê.
Gurgîn di mabeyna kêl û xêlan de ji xwe re şaş
129

mabû; ne dizanibû ku roj xêr e û ne jî yan şer li
xêrê hatiye rapêçandin. Lê wek mesal ku yê tazî
xwediyê şilfaxwe ya bazî be. tiştêkî din êdî jê
bitirsiya ku wenda bikira nemabû. Û ne jî diket
hewleriha giyana xwe ya kederdariyê. Ha bi wan

"e"lîf û "z"eyan re çend roj li cem Paşê ma. Lê
 Paşayê dilşad û gelekî mêvanperwer. ne tişteki
 jê pirsî û ne jî tişteki gotê. Hema bi gav û saetê li
 pêşberî wî rûdinişt û ziloq dibû li nava çav û
 biruyên kevanî dinihêrt. Hin caran jî stêrk
 dibarandin. hin caran jê re dikeniya û hin caran
 jî digriya. Gurgîn li wê yeka Paşê şaş mabû û
 gelek jî fedî dikir. xwe bi xwe digot û hin caran
 dibiland: Gelo tawanê min çi bû. ku vî Paşayî ez
 xistim girtêgehê? Lê niha jî xwe ji min re dike
 doşek û xalî? Ez. mirovekî biyanî
 me û tu
 faydake min jê re nîne jî!?
 Gurgîn hêj di nava wan sêwr û ramanên xwe de
 mîna keştiyeke
 bayê ketibû ber pêlên kul û
 derdan
 û li ser deryaya
 xeman
 xwarovîçko
 dilewlibî. Paşê bi dengekî xuremwarî jê pirsî:
 - Filankes. Tu ji kur ve têtî. tu yê bi kur ve
 herî. tu çi kesî. ji kur î?
 Gurgîn di dilê xwe de keniya û piştî got:
 Teeew. tew. Bîstikek bihurî. dev pê kir:
 - Paşayê min. Ez ji girtêgehê tîm û niha li mala
 te me. Lê eger tu min berdî. ez ê bi riya xwe ve
 herim. Serpêhatiya min jî pir kûr e û gelek jî dûr

e. Di ser de feleka xayîn jî carekê rabû şimaqeke
130

hincirî li min xist, ez Jî ha wisa bi dinyayê ve
terqizîme û libajarê te rast hatibûm.

- Gereke tu serpêhatiya xwe bo min bêjî.

- Paşayê min. Derdê min pir giran e. Heke ez
bibêjim, tu dê xemgîn bibî û belkî tu ji xwarinê jî
bêyî qutkirin.

- Gereke tu bêjî.

Gurgînî ji xwe re sêwirî, geh di hinavê xwe de
keliya, gahî dU lê fûtiya û piştire devê xwe vekir:

- Paşayê min. Ez kurê Baroz Paşayê welatê
Pêncşayê me. Dema ez hêj xortik bûme, xeratakî
ji min re firfirokeke bayê diyati hanîbû. Rojekê
ez li firfiroka xwe siwar bûm û firiyam. Îcar min
nizanibû ku ez ê çewa dakevime erdê. Ha wisa ez
firiyam û çûm, firiyam û çûm ... Piştire min pîlê
firfirokê bi jor ve bada, îcar ez bejêti erdê bûm û
çûm li bajarekî biyanî ketim. Li wir ez bûm lawê
pîrekê. Paşayê min, de ez çi bêjim. Derdê min
pirî zahf e, xilas nabe. Piştire ez bi keça Qiralê
bajêr re zewicîm. Ê... Lê girînê hew rê da ku Gurgin
li serpêhatiya xwe bidomîne. Îcar Paşê got:

- Niha eger tu wê jina xwe bibînî, tu yê wê
binasî?

- Erê.

- Eseh?

Gurgînî serê xwe bejêr kir û dîsa dev bigîne

kir, çend dilop hêsir ji bo jina xwe ya di ber
êşîka zarûkan de rijandin erdê.

-!!!

131

Feylezûr Paşê hema rabû çû odeyeke din û
kincên paşatiyê ji xwe derxistin. çû destek kincê
pîrekan lixwe kir û hate cem wî:

- Ka binêre. Tu min dinasî?

Gurgînê Paşê hêj nû Jina xwe nasî. Lê çavên wî
tije hêsir bûn û xwe ranegirt. bi dengekî bilind
qêriya û pirsî:

- Lê ka zarûka te?

Feyruşayê Gurginî da ber hemêza xwe û nehişt
ku ew zêde bigrî. dilê wî rin xweş kir û piştire
gotê:

- Jixwe ez Jina te me û tu Jî şûyê min î. Zarûk di
x1zna Xwedê de zahf in. Wê zarûkên me Jî çêbibin
û em ê Ji wan Jî zivêr bibin.

o

132

Pirtûkên çapbûyî:

1) Xwençe

Cild 1. 2) Xwençe Cild II.

3) Xwençe

Cild III. 4) Xwençe Cild IV. 5) Xwençe Cild V. 6)

Xwençe Cild VI. 7) Xwençe Cild VII. 8) Nimûne Ji

Gencîneya

Çanda Qedexekirî.

9) Işkencede

178

Gûn. 10) Siyabend û Xecê. 11) Xwendina Medresê.

12) Kadîna Mişkan.

Pirtûkên klasik ên wergera Ji tipên erebî bi

latêDi û çapbûyi:

..

l'

.....v----.....

1) Dîwana

Melayê Cizîrî. 2) Nûbihara Ehmedê

Xanî. 3) Mewlûda Kurmancî ya Melê Bateyî, 4)

Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî ya Mele Ehmedê

Qoxî. 6) Sirmehşera Feqe Reşîdê Hekarî.

6)

Nehe-ul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, 7) Dîwana

Pertew Begê Hekarî. 8) Rewdneîma Şêx Evdirehmanê axtepî.

9) Dîwana Şêx Evdirehmanê

axtepî. 10) Mîrsad-ul Etfala Şêx Mihemed Kerbe-

la. 11) Iqdê Durfama Şêx Eskerî. 12) Herdubat.

Mewlûda Mele Zahidê Diyarbekrî,

13) Leyl û

Mecnûna Şêx Mihemed Can.

wi hiç nizanibû ku pesn û wesyeten dela11ya
delalan bidana û behsa rindiya rindê bildra.
Jixwe birçiye dilxemgin Ji rinde re heyran dima
û şaş mabû ku çi bike: ne karibû here t~
û ne
Ji karibû bi şûnde vekişe here male. Hema z10q
bû û 11
serçavên di bine temeziya zer de neri. Ew
delali. ew şanazi. ew beybûni. ew gewreti û
bedewiya le. hemû nexş û nimûşen Mani
diavetin mazata mirîşkan. Ne Ji 11dinyaye zeri û
perî dikaribûn pe re hemberti bikin û ne bi
helbestên Teyrani. ne xamekêşlya Ciziraiû. ne Ji
niJadxweşiya xani ku bi reşbelekiyan ve dile
miriyan Ji Jindar dihelin. ne Ji qelema Axtepiye
bengi karibûn kêl û kelsima bedewê textne
sindoqa rastn1vise û ser û sinç le xweş bikin.
Wey bavo. 11
min birawo. edi hewqas Ji? Here ka
beje. bi çi destûrê tu Ji mirovan fişt1qiye û bi
havmê axin hatî meyandin? Na. ev yek ne rast e...
l8Bif 91 972090 3 1
Kurteçîrok
Balûlkan
Hesen Silêvaneyî
APEC

BALÛLKA ŞEKIRÊ

Kurteçîrokên

Hesen Silêvaneyî
ISBN: 91-87730-66-9

APEC

Kurteçîrok

BALULKA ŞEKIRE

Hesen Silêvaneyî

Weşan no:66

Utgivare: Apec-Tryck & Forlag

Box 3318,16303

SpangalSweden

TeL. 08-761 8118. Fax: 08-761 2490

ISBN: 91-87730-66-9

APEC

Têbînî

Ew pirtûk bi riya kek Xalid gehiştê destê me.
Dema me dît, ku nivîskar ji başûrê welêt e û xwestina wî heye ku bi latînî pirtûka xwe çap bike, em pê kêfxwaş bûn. Piştî ku me pirtûk di çav re derbas kir, me dit çewtiyên rênivîsê gelek bûn ...
Ji ber hendê çapkirina wê dereng ma. Rastkirina rêzimanê wê me li gor rêzimanê Mîr Celadet Bedirxan nivîsî û ferhengokek biçûk jî, di dawiya pirtûkê de berhevkir. Ji bo vî karî, em spasiya Beşîr Botanî û Amed Tîgrîs dikin.
Em hêvidar in ku birayên me li başûr û rojhilata welêt jî, weke me bi latînî binvîsin. Ew jî da ku em ji hevdu têbigihin.
Di gel silavên germ!

WeşanênAPEC

Balûlka Şekirê

Bêhnek xweş ma bê deng û diqulaç û dîwarên şkefta tarî û bêhinteng fukrî. Heta tirs û tariyê, xwe kirine yek û qesta wê kirin û rahêlanê. Yekser "Helûka" çar salî xwe avêt di danga dayka xwe û serê xwe yê qijavij û berdayî hişk bi singê wê vena:

-E ...Ez birsî me O da ... min balûlka şekirê divêt.

Babê wê bi rex ve lê heytand:

-Dê hiş be kiçê, ma nûke demê hindê ye? Helûyê berda giryê û destên xwe bi çavên xwe venan û serê xwe ji sîngê dayka xwe vekir û bi hîvî berê xwe dayê ...bi rondikan digote;

"Ez birsî me O da"

Bê agir cerg û hinavên dayka wê li ber rondikên birsê û
7

Janya zaroya wê ya nazdar dihatin sotin.

-Helûkê, daygoriyê, bes bigrî û dilê min ne sojîne. Eve ez dê biçim bo te balûlkeka şekirê çêkim û bînim, û çî diqewimit bila biqewimit. Mêrê wê kîskê tûtînê ji ber şûtka xwe raîna derê û ma di pê xwe yê rast yê seqet fukrî. Sê sal di wê gavê da kuştin:

-Ûsif heme kutanke û nehêle kes nîzîk bit çetir e. Ne şola te ye ... Xwe jê dûr bike ... Bela ye.

-Ez dizanim bela ye û ne yariyek e. Lê bêhna min qet nahêt demê ez vê gula nepeqî hosa çiklandî li ber derê malê dibînim ... Ez dê li her...

-Ûsif... Ûsif

-Haha ... Alya .. te çî ye?

-Çavê te li kiçkê bit ev e ez ê biçim!

Dizanî ji axavtina wî bê wuc e, kes wek wî serreqiy wê nas nakit, lê di ser hindê ra gotê:

-Dîna Xudê neçe ... Neçe ... Ma te haj qîre qîra firokên segbaban nîn e.. nê li vêrê guhên me kerr kirin.

-Ma tu min nas nakî Êsif? Axavtinênxwe di avê da neberde.

-Ma tu li mirina ..." eûzu bîllah" ... Pîrejineka serspî û alek qurmiçî nêzîkî wê gotê:

-Rûne xwarê û neçe, kiça te her ji birsa namirit. Ewî
8

pîremêrê tisbiyên reş di destan da jî gotê:

-Alya ... navê Xudê bîne û nebe belakir .. Hema tu derkeû, îroke dê cihê me bibînin û dê avên şkevtê ... Alya yê her du çavên Helûkê maçî kirin û berê xwe da pîremêrî û bi zimanekî req lê zivrad;

-Netirse sofi Elî, netirse! Tu namirî ... hindî em xudanên xwe û hewe bin, her dê halê me hosa bit ... Ma . nebes e jîna serşoriyê sofiyo?

Alya hêj ji biçûkatî zîrek û bi zefer bû ... Di gel babê xwe diçû çiyayê Bêxêrî û dar dibirîn û girêdidan û dida pişta xwe qesta malê dikir ...Jinkên gundî jê diman hêbeû û mendehoş û sehma wê ketibû dilê hemiyan.

Keîk:a serê xwe baş şidand ... Lewendiyên xwe girêdan ... Dangên kirasê xwe li nav tengê pêçan, û bixar ji derê şikevtê derkevt û qesta gundî kir, yek terq nedizanî ew ber û berzîvên di rêka wê da çî ne û çî nînin, çî xem ji

stirya ne dixwar "ma li ser darê dunyayê min kê dî, heye
ji bilî te merg goriya min Helûkê ? .."

Mîna xûsara biharê li ser ruyê gul û giyayê, xuhdanê
leşê wê û nav çavên wê şil kiribûn ... Car cara da bi destê
xwe hindekê jê zuhaket û gelek caran jî bi livka kevinka
xwe ... Hêj ji dûr ve dît, dûkel û tem e dînan yên bi ser
gundî vediçin ...Bê hemd, ji nîva dilî rahêla axînkekê wey
li minê ezê ... Malên me jî sotin .. Newêroka bo me zîrek
in, em ên dest vala û bê çek ... Heyla Xudê hûn kuştîn.
Piyên xwe siviktir kirin ... Çavên xwe ji gundî nevekirin
heta gehiştê. Xaniyên gundî, ser û bin yê bûn yek ...
Qûtê wan yê disojit. Terş û kewal yên di xwîna xwe ra
digevizin... Qabkên doşka û saçmên topa tijî kolanên
9

gundî ne. Bi dilê mirî û hinavên kuzirî û bi çavên girî
hêdî hêdî qesta xaniyê xwe kir. Oda qûtî ya hatî xwarê bi
ser yek da. Karîte ew zire karîte yên bûn çar-pênç ker.
Bagurdanê serbanî, li nîva hewşê qet qet e. Kentora wê
ya bûkanyê, muşekê ya di erdî ra biri ye xwarê. Hêj
wesa bi kul û keser ya di xanyê xwe yê wêrankirî fukirit.
Ji dûr dengê firoka dilê wê quta. Bi piyên bê rih bezî bo
alê kehniya jinka li milê rastê yê gundî, xwe avêt ber
kevrek mezin. Du firok dîtin bi nizmî di gel yek difrîn.
Dengekî bê qam tîj jê dihatin. Her li dorên gundî dulan û
zivrîn, paşê barê mirinê li kaviên gundî reşandin û bi
keyf xwe bilind kirin esmanî wek du "teyrên" têr xwarî û
qesta bingeha xwe kirin. Alya zivirîve gundî, li şûna cihê
mûşekê çaleka çar-pênç gez fireh dît. Ya jehatî heme

herdu destên xwe berî esmana ve kirin û bi dengekî bilind qêrkir "Xudê, bu xatra Qurana te ya pîroz ew xêrê li ser dunyayê nebînin hindî hene bi çi heq em hêlan bê kolk û xanî? Ya Xudê tu heqê me fiqîr û jaran wan zala bistînî... ya Xudê ... ya Xudê ... "Helûka minê dayê da bo te balulkek şekirê çêkim" li qotîka şekirê gera, li nav amanên bê rêz belavkirî dît. Sifreka nanî tijî nan û durik kirin "nûke bicûk hemî birsî ne wek teWokê, bila ew ji bi xêra te bixwun ..Ev nane têra hemya heye!"

Rêka çarêkek se'etê nemabû da bigehit şkevtê sê fir-
okên dî li dol û nihala deng vedan û ezman şilqandin.
Alyayê kir xwar da bigehit nihalê û xwe veşêrit, lê yek-
ser yek bi dûv ket û xwe nizim kirê û di tuxubên urteka
pênç sed gezî de di dola hindav serê wê ... Hecar da be-
rekî raket û têwerkit bê feyd ... Piştî têr yarî pêkirîn û
êciz bûyî. Devê doşkê lêvşkir û mêraniya xwe lê diyar
kir... Leşê wê pirt pirt kir...U qesta alê rojhelatê kir û her-
dukên dî jî rêya wê girtin ...

LO

Qotîka şekirê li erdî ristî bû, xûna sor di gel têkel bibû,
sifreka nanî wek xwe girêdayî mabû ...

Ji dûr ve dengê dihat û nîzîk dibû:

-Alya ...Alya rewşa umer pira .. Te ci mal li min û xwe
xirab kir .. Edi çewa dê hedara Helûkê êt ...Alya ...Alya
Ji dengên qêriyên jinka, Helûka nivistî ji xew rabû, gote
havala xwe cinuyê:

Nûke dayka min dê bêt û dê balûlkek şekirê bo min
înit... Ez ê kim du qet, qetek bo min û ya dî bo te bilanê?

25.11.1985

11

Sibe bihar dê gîrnijit

Bi dengekî jar û melûl û harî bê tûxûb û ûna zarokeka sava û têhnî li leylaneka xîzê wê dibiriqit, li ber tîrojken rojê radhêla qêrîya. Hêdî hêdî û bi giranehî şev diborî û qêrîn û axînkên wê difîrîn bo esmanê çandî bi pinîyên ewrên ji yek du sil ...

Li wî koşê bê ser û ber ji oda bi ax spîkê boyaxkirî dirêjkirî bû. Li ser kudad keka reng jê çûyî û pêû ... Bî rex ve ew pûejina dêm qurmiçî û pir rêz û xîçên kûrên têk firîn bi keyfa xwe. Li nîva herdu çavên bazîdayîn quqilkî, tenahî û gemû û evîn geş bû. Dev û lêvên wê caran ji ser yek radibûn û hindek qesên olî yên taybeû bi piste pisteka nizm digotin. Bi heû zanîn û aqildariya xwe û bêhn firehî harîkariya wê dikir ... Gelek caran, hawarên axê kunkin dikirin û diborîn ûna birûîsya û digehîştin guhên wî, bi hêz û reqî û li nîva dilî akincî dibûn, ta hest dikir dê çerx li wan gavên hilma mirinê jî di fîrit, rawestit... Li çavan dîyar bûn şûnwarên rondikên hîviyê û

15

daxwaziyê ji xudanê şev û rojan, ku barê wê yê giran bi janên mirovatiyê yên pîroz sivik bikit û ji wan wêneyên direwînên li ber çavan dileyzin rizgar bikit..

-Dûkêl ji menqela wî ya dirêj kanî û kevn û pîs bi komelên girovir yên yek çu da bilind dibûn û li jorveyê odê belav dibûn. Bi çavên xwe yên zîq berê xwe dida tiştên ne-ên dîtin û dûr. Her wesa berê xwe dida belgên

çulî yêni hişk, û hatî xwarê li ser karîtên barê serbanê si-
vik bi sanahî hilgirtî. Bêyî hemd û bêyî ku hay ji xwe
hebit wek dilekê nexoşyeka ji mêja, ket warê hizr û bîra,
ma eger ew ... dê çê kim û dê çi rojek bê îfleh bit. Ya
Xudê agirî û avê û hemu cîhanê, bo xatra navê rehmê,
xêrê, navê sitêr û esmanan, tu gemya wê bigehîne ber
lêva tenahîyê. Eve çend sal in ez li hîvya vê rojê, Ba min
tu divêyî bi jarî û rênçberîya te, bi lawazî û dilpakiya te,
min tu divêyî hişyar be min nehêlî bi tinê! Ne ... ne tu
min nahêlî... dê çawa min hêlî? Viyana te nahêlit mirin
lîîzîkî te bit;...a...a ...Gulek biçûk dê li gulistana me vebit
U girnijit...U em ê bi hîvî û viyan û xerîbî xudan kîn. Dê
mezin bit...mezin bit û bêhna wê belav bit li hemu alan.
Dengê wê ...ah dengê wê, dê çend xweş bit, bi awaz bit,
mîna mişwêna sûlavan li meha Gulanê. Çend nerm û na-
zik bit, peyva "babo ... babo ..." Ewa her spêde zaroka min
dê bêjit min ez ê te bim ber van mêrg û kaniyên di singê
çiyayî ra, ew ên qeşeng û dîmenciwan. Da bayekî pak û
paqij hilkêşî û viyana warê te di nav xwîna te da bigerît.
Em ê bigehîn revdên kewên nikilsor û singrengîn, bi wan
perên jêhatî. Em ê silav kîn kotirên spî ew ên hej firîne
dikin her û her. Makî nabêjit em ê ji kay fa wek kotirka
firîn û dadîn li bin dareka gûza şûştî bi befrê, û di gel
gul û gul çîçeka, nêrgîza û beybûn û nesrînan leiyzîn. Ez
u tu dê qêrr kîne stranan û bi çiyayê spî ve biçin û
guhîjka bixwîn û tûrkê xwe tijî hêjîr kîn û bo dayka te
bA A ... h a... Ç'? Ç awa.? D'bA'AdAki ç b'? E z nîzanîm. M a

ez ê ji kî ye zanim? Bilanê ...Bila ..a..a...Xozî kor bit... Da cotî û kêlanê harî min bikit.. Ez ê fêr kim hellû şolan, gelek matî jê kim erê ... Çawan e, erê ez ê fêr kim swarbûna hespî û vêrisiyê û wan ên hêzê û tengaviyê ew ên babê min nîşa min dan. Ez dizanim çavên te dê wek yên min bin, ne gelek caran min tu ye dîtî û li ser xatra wan çavan, min guhê xwe ne dida xelkê, demê digotin: -"Berde, berde. Xwe ji fêqiyê jînê bê par neke. Ma dara bê belg û rût û rewat bo çi ye? Bo xwe seh ke, jêke dî, da te jîk wek zelaman dîndeh hebit û navê te hilgirin piştî mirina te ..."

Dilê min şedekî dida, ku her salekê dayka te dê bi hal kevit û dê bihêyî. Lê, bizane, jîna me giran û dijwar e, zîrekî û mêranî pê divêt... Ka çawan babê min imtîhan bi min dikir, ez ji dê bi te kim: "Cotyaro! Min çivta nêçîrê ya hêlayê li serê lutka ker firînî, eger te piştî seetekê anî ez ê te li rêza zelaman hisêb kim".

Çi caran ji bîra min naçit, ew gava babê min xwe di min werkirî û ez givaştim ber singê xwe, ez maçî kirim û gotiye min: "Ji îro pêve şêm bi dilekî rehet û piştrast fê-qiyê xwe bibim, li bajarî bifroşim, tu yî zelumê malê li karwaniya min. "

jiyê min û Hingê min hest kir deh salên dihatin ser leşê min yê nazik û lawaz,yê dihête vekêşan û mezintir dibit.

Ev çiqê yê şelwalê min dirandî û kevrê ez jê ferestîm û hilke hilka ez têda hemu ji bîra min çûn û dilê min di singê min da dikenî.

Lê ez dê nîv seetê bi tinê dim te nê jîn yan bûyî sew-
keka pîla ye, ji berê aloztir bûyî. Lewma divêt tu xwîhê

17

ji bask û milan birêjî û ji min zîrektir bî. Da bişêy pê-
gavên firehtir bavê û bi jîna nû ra bigehî û tam ke dest-
keftiyên wê û jê bê behir nebeûn.

"Ay babo ay Xudêay...ay" gêriya wê ya dijwar ji
xewn û hizran îna derê: Ya Xudê bi selametî rabit:.Hûr
hûr cipkên baranê erd dişûşt li pey awazek xweş û na-
zik. ..Di gel xweştirîn dêngî di jîna wî da "Waq ...Waq ...
Wa... Q1... Q' ""IT

1... vvaq... " B' hA

1 ezter, barane IAKir u IAKir ...

Ji dilşadiyê neşya xwe bigrit... Pê li şermê kir û piya û
keyfê dan pêşiyê û çu oda wê ne ji heşt qavan jê dûr ...
Dergehê darîyê reşandî bi bismarên ser gunbabok vekir,
û bi herdû çavên xweşî jê difirîn berê xwe dayê, neşya
biaxivit ji dîtina ewilî ... Ezmanê wî nîv şikestî ma ...
Guhîştî, neşya hestên xwe yên pir şadî mîna şadîyên
newrozê dîyar kit. Le "Nisrîn" baş pê dihesîya ... Ji nêzîk
bû, dêmê we bi rengê mirnê bu ... Geşatîya çavên wê ve-
mirî bu ... Enya wê ji çipkên xuhê mîna xunanvê sil bû ...

"Pa tu jêhatî yê hosa bi sirustîya xwe ya rast, bêy kil û
kirasên şevbêrîyan. Xuh ji enyê malî û maçî kir:

"Şikir ji Xwedê ra bo vê dana pîroz û silametiya te .. "

A

U girnijînekê xwe li ser lêvên Nesrînê helavêt û gotê:

-"Dê navek xweş lê bike!! "

Cot yarî berê xwe da kiça xwe ya navçav befrîna pêçay
li ser sêhlê, bi rex deyka xwe ve û vîyana dilê wî bûn
peyv û darijitin:

-Sibe bihar dê girnijit, hej cegera min, Perwîna bemn ..."

Mûsil 1203. 1983

18

Mirina Serfiraz

Dergehê oda siyê vekir, hindî Xudê hêz dayê palek
pêra da. Dev û dev vî erdî ket. Şirka xwînê xwe di serî ra
avêt. Ew patê reşê tarî yê her du çavên wî pê girêdayîn ji
xwînê şil bû.

Ew ne cara yêkê bû, ew çepelê pîs palan lê bidit yan
zilehan danit bin guhên wî. Ev deh roj bûn, eve bû halê
wî di destên wan da, lewa bê deng ma û neaxivt...

Xudanê rîha, zincîrên her du destên wî vekirin, pate jî,
ji çavên wî vekir û di xwîna serî da. Hinek çipkên xwînê
ji eniyê malîn û bi du çavên hîz û pir neviyan gotê:

-Hişyar, xwe hişyar ke! "aqilê xwe bîne serê xwe û
bibe mirov!" Xwe ji vî halî rizgar ke, an jî dê li ser dun-
yayê cehenimê bînim pêş çavên te û hestiyek saxlem di
leşê te da nahêlim. Min çu kesê xwelîbiser û heşpêwer
wekî te ne dîtiye, qet kuro ma te divêt bimirî??

Bi koteka Hişyarî şiya serê xwe ji nav stuyê xwe bi-
lind kî. Destên xwe ji erdî rakit û nîzîkî çavên nîvvekirî
bikit. Berê xwe da sûna zincîra li her du destan û bêyî

21

berê xwe bidit xudanê rîha, bo xwe got: "Kanî bu-
sulmanetiya we? Kanî mirovatiya we? Erê, erê, destan di

zincîran da bizînim! Ronahiyê ji çavan bidizin! Nînokan
ji tiblên öînin der!

Hêdî, hêdî Hişyarî xwe rakir û got:

-Ez dê hinek rêzan ji helbesteka xwe bixwînim, eger tu
jê razî bûyî, dê bi wê pişikdar bim .. Xudanê rîha girnijî.
Çar didanên wek tevşiyên tûj di nav şkefta devî da diyar
bûn:

-Bawer e serê te yê wek berî req. Piçek yê nerm dibit.

Dê ka ezmanê xwe bigêre, ka dê çi bêjî?

Hişyarî berê xwe da xwîna xwe ya li erdî hişk bûye û
peyv li ser lêvê livlivîn:

Welatêmin

Welatê bab û bapîra,

Dê te avdim bi xuh û xwîna hat peşmergê me tu bi bîne

Welatêmin

Welatê mêrxas û şêra

Dê bim birûsk li eniya neyara

Nahêlim biherifin kevnewara

Welatê min

Welatê nêrgiz û kewa ...

-Bes, bes segbab, bes e

Agir ji çavan difirî. Bêhin lê teng bû. Enya wî bû girêk:

-Tu nayî ser rêka rast, eger min her du çavên te ne înan
derê, tu raweste?

Bi destekî, destê Hişyarî girt û bi destê dî ew perda kes-
veda ..

Kursîkekê xuyakir ... kursî bi Hişyarî dikenî û eger

22

şiyaba baxivit da bêjitê:

-Jaro, Hişyarî bireve hêj tu neketî ber derdê min, derdê min derdekî gelek giran e.

Mîna gawiran, Xudanê rîha li Hişyarî heytand:

-Rûne ser kursîkê û paşî behsê serfıraziyê û azadîyê bike!!

Demê Hişyarî ew kursîka kar kirêt dîtî, tirsê dilê wî girt, rengê wî pêtî bû:

Ax kursîka pîs û bê bext, tinê Xudê dizanî ka tu dê çi li min kî? Ez dizanim tu çu ser û bera di halê min nahêlî.

Ax ...axxx kursîka pîs!!!

Hizrekê dibir û yekê diîna, hinek peyv bi wêneyekî mij û moranî li ber çavan dileyizîn. Hindî hatê neşiya baş rîzkit, ji bilî van peyvên:

Li vê jînê min heye yek daxwaz

Ew jî ku her dem bijîm serfıraz.

Bê hemd, piştî xwe bi kursîkê vena ... Cîhan li ber çavan biçûk dibû ew xudanê rîha û kursîk û ode bi tinê.

-Helbestvano! Piştî rast be, êdî ez destê xwe nakim te.

Tu û kursîk pêkve dizanin. Lê, bo cara dûmahîkê dibêjim te eger tu di fêstîvala me de, wek me divêt pişkdar bi, te çi divêt em dê bidîn te. Pare, xanî, trimbêl, çi welatê te divêt em dê te hinêrînê, te çi got?

Hişyarî piştî ji kursîkê vekir û berê xwe da tilên destên xwe û got:

-Li min negire, ez neşêm dengê xwe bifroşim dijminê

23

welatê xwe, mirov bi hizr û bîrên xwe mîrov e, eger fir-

otin, ew ma kelexekê bê rih û xwîn ...

-Hêj ezmanê xwe dirêj ke lewçeyê lewçe!

Tibla xwe dana ser pişkoka sor, kursîk bi Hişyarî ve zivirî û zivirî, ku xudanê rîha baş Hişyar nedidît. Ji nîva dilê reş dikenî û dikenî:

-Hah ...hah ...ha ...ha ...ha hah Tu dê li ber singê me rawestî hey dînê dîn? Ha .. hah dê bixwe dermanê xwe, tu bi serve yê û hêj eve kê m e bo te û lewçeyî yên te hah ...hah! !

Demê bo cara duwê tibla deynayî ser pişkoka sor, kursîk rawesta. Hişyar nehişyar bibû, bi cilkên xwe ve helavê bû. Serê wî şor bibû erdî. Erzinka wî ketibû ser singê wî. Miriyekî neveşartî bû.

Xudanê rîha sitleka ava tezî bi leşî da kir, cih de veciniqî, mîna yêkê nivistî û kabûs lê bikin qîrr û hawar.

-Helbestvanê law xwe berhev ke, bo programê herne rengê pişkoka reş, hah, hah .. !!

Ne ...ne ...Bextê Xudê bes e, bes e e..e ..Ez, dê helbestekê ji we ra bixwînim.

-Lawê mino, çi hewcey van xem û êşan bû. Li berahiyê, da berê xwe dê weca xwe. Hizr û bîr ci ne li ber kursîka me ya delal! Em bera di helînîn. Vêca çawa tu dê xwe li ber me girî. ?

Xudanê rîha, cixareyek berdayê û zengil lêda. Du nobedaran pêkve dan di jor ve û gel yek gotin:

-Belê ezbenî. Yek ji wan zelamekî zelum bû. Singfireh,

24

bejinbilind, leştijî weke gamêşê. Yê dî bi çavekî bû. Mi-

rov ji nav çavên wî yên bi tirs, ditirsiya.

-Hişyarê delal, mêhvanê min e, bi bin jora jimara çarde
û law guhdariya wî bikin, başe!

-Belê ezbenî, dê we bit wekî te gotî.

Hişyarî her berê xwe da wê oda law lêkdayî û raêxistî
wî textê eve şeş şevan li ser dinivit. Hizra xwe di wan
her du nobedarên li ber derî kir, hêdî bo xwe got:

"Erê ma ta kengî em dê di bin destê van dehban ve
bibîn?

Zengilê lêda, Hişyarî dergeh vekir. Xudanê rîha bi keyf
da di jor ve: rengê te gelek xweş e Hişyaro, xwe lêk
bide da biçîn demekî kêmayê bo dest pêkirina
fêstîvalê

-Kerem ke, da biçîn ez amade me.

Holeka bêqam mezin bû. Tijî xelk bû. Kursiyên pêşiyê
hatî bûn hindakirin bi komek serên mezin û dêmên tarî,
Ronahî yên hemereng li holê bi şehrezayî belav bûn.

Mişe û nerên êzgeh û televizyonan amede bûn.

-Xûşk û birayên hêja! Hozanvanê siyê, hozanvanê

Kurd Hişyar e, bila kerem kit. Bi bawerî, Hişyar bi ser
depê şanoyê ket. Nêzîkî mîkrofonê bû, çavên wî bi xelkê
ketin, hêdî, hêdî wênên Newroza par di mêşkê wî da di-
leyizîn. Ew hozana li wêrê xwendî hat bîrî:

Çiyayên me deng vedin, dibêjin xwînê ji welatê xwe ra
birêjin davên tavê çava disojin dê sirûda şehîdan bêjin ...

"Kanê ew roja pîroz? Kanê ew heval û hogirên ji dil?

Kanê ew dûmenên bêxêrê befrîn? Xabûro pîrr evîno ka,

25

ka tu çend ji te Ê mişêna te xerîb im . Welato soz bit, ez tola xwe vekim eve xweş delîve. Ma jîna buhar lê nekenit. Ew jî jîn e? Ma teyrê di gel reva xwe nefirit bo çî ye?"

Bi kerb û kîna çiyayî, Hişyarî, bi her du çavan stêrk li wî wêneyê mezinê di holê ve girt û destê xwe yê çepê dirêj kirê, û bi cergê sotî got:

Xwînmêjo

Dilreş qirêja

Sewda sero gêjo

Tu çend law û genca bikujî

Hindî sera li serfiraza bibirî

Hindî wek sa birewî

Dê mînin ser viyana vî warî

Heta tu birizî

Xwînmêjo

Dilreş qirêja

Sewda sero gejo

Çend tu me ji welatî dûr bikî

Çend tu para li me bireşînî

Çend tu bi top û tank û firoke bî

Tu neşêy viyana vî warî

Ji dilê me bînî derê

Tu neşêy peyvên viyana Memê

Ji dilê me bînî derê

Tu neşêy peyvên viyana Memê

Ji dilê Zînê bavê derê

26

Xwînmêjo

Dilreş qirêja

Çû zemanê berê

Weke berê li binê gerê

De herrê şoreşvano herrê

Demê Hişyar, ji ser şanoyê dihate xwar, çar nobedar li hîviyê bûn. Destên wî girtin, mîna benîştî pêve nivîsan, di dergehê nihênî ra birine ji der ve. Mezinê wan gotê:

-Xwelîbisero, tu nabêjî min çî gehîşte te, tu dijî me a-xivtî? Kî dê bêjite te aferîn?

-Bawer bike, ne bi min e, ez çiyayî me û ez neşêm serê xwe çu çaran şor kim ne xasim bo xwînmêj ên wek we.

-Tu dizanî cezayê çî ye?

Serê xwe hejand û bi bişkurîn ve got:

-Mirin were, wek pêlên Xabûrî were

Li wê şevê, girtî hemû kom kirin, li pêş çavên wan, ew werîsê rûs kirin hefka Hişyarî û helawêstin.

Çu stêr ji esmanî neketin xwar û nevemirîn. Lê stêra peyvên Hişyarî bo yek û du vedigêran û dibiriqîn:

Ez im xortê Kurd

Rêvingê li serê riya

Dê kim çî ya min viya

Qet nakevim bin piya

1984 Mûsil

27

Seetek li cem nojdarê şadiyê

(Wey bo şadiyê- were jor û janan bihêle- Şadiyê ... Bibe)

Min ew payv e di nîva depekî Dîhinkiri bi gilopek spî,
liber dergehê avahî xuvandin ...

Ji mê je were min hez dikir, ez herim cem vî zanayî
derûnî. ew ê dibêji:

"Ez şadiyê bo bergera nên xwe peyda dikim."

Erê hûn vê axiftinê bawer dikin? Yêkê ji we eve za-
nayê derûnî dît? Kî dibêjit ew zana ye? Ew çima ez ji ge-
lek tiştan bê bawer im ?

30

Duwanzdeh peykan ez serkettim, demê ez li destê rastê
zivirîm, eywaneka biçûk bi qenebêt kevn û pênc
kursîkên tozgirtî û mêzeka bê ser û ber, çend kovarên
biyanî li ser, ketin beranberî min. Ez dişêm sûnd bixum,
evî nojdarê derûnî, ev tiştên kevin ên jî "Bazara Hereç
li Babil topî" kirîn, dilê bajarê bi tenahî nivîsû li ser her
du lêvên Dic1eya xêrê.

Min hêv kire odê û dîwarên bêhna genî jê difuî mîna
çerêmê seyekî mirî berî çend rojan. Li dîwarê beramberî -
xwe, min kevalekê, seyekî, bi dest risimkirî dît, yê bi
keyf, yariya di gel pişîkekê dikit. Erê ez jê bipirsim, çî
ye ramana vî kevalî dimê diçime jor? An jî dê tûre bit?
Lê, dibêjin nojdarên derûnî zû bi zû nabin û eger tûre
bûn, xwe jî xwe bavêt û termê wî bibit sewik, li ser lêva
cadê, da roje di, rojnamên spêdê behsa mirina zaneyekî
bi lîmet di kavdanên tarî de bikin û seydayên pişka
derûnî li zankoyê ji şagirdên xwe, daxwaza
nivîsînên
berfireh li ser vê mirina mezin bikin.

Bê guman ez dê çênd heyveka bim mêhvanê pirsîyarên polîsan û dadgehê. Çunku ez ne ew kesê bi tinê bûm, yê sera wî dayî û we ..

Hîviyan ji te dikim nojdarê delal, camêr xwe ji pencerekê ne avê berî tu min bibînî.

Min toz ji kursîkê da guta û hêj ez baş li ser ne rûniştîm em pêkve ketin û me dengekê nexweş tijî eywanê kir. Yekser ew dergehê li beraberî min vebû. Zelamek jê derket, bi pantolekî şîn û gum1ekekî gulgulî, xîç kêşek spî mîna pirça li dûr çênîkên wî. di destê rastê da bû.

- Ma tu agehdar nabî berî bi rûnê? Ma te nedît kursî bi tinê bi sê piya ne?

31

Bi axiftina xwe di gel min, mîna yêkê di gel zarokekê baxivit, bû zanîn simbêlên min, binê kebê min heta lêva xwarê reşkirî ne. Awirî yên wî xerîb bûn, di gavê da çavên xwe diniqandin û vedikirin.

Bi rastî boyinbaxa wî cihê kenî bû. Kesk bi rengê darê û rismên kaxezî mîna yên sînéleyan li ser bûn.

-Bibûre ger min tûre kiribûBawer bike min baş berê xwe neda pêpkên kursîkê.

-Bi rêzgirtin û tazehî, min we gote wî zelumê rawestiyayî li peşîya min.

-Min kursîka duyê bi destmala xwe ya nehatî şûştin ji eyniyekê were. paqij kir û ez rûniştîm Ewî bi awiriyên pirr pirsyar berê xwe dida min û peyivî:

-Te rîpeka hey, ma ne we ye?!

-" Eger min rîpek neba ez da hêm vêrê çi?"

-Belê ... û divêt nojdarê derûnî bibînim eger delîve heb-
it.. Bi xwe girnijîna wî jî, ne girnijîn bû. Lê sîtavka gir-
nijînekê bû ..

-Kerem ke were jor. Ez ew bi xwe me. Min hizir fikir
evê li beramberî min rawestiyayî, yeke ji harîkarên wî, an
sekretêrê wî ye ... Rûnişt li ser kursîka xwe ya zivirrok,
min bawer nedikir vî nojdarî, dê ev kursîk e hebit...Min
hizir fikir bi tînê emîn darên giştî û mirovên, gelek me-
zin û zikstûr, li ser van kursîkan dirûn in. Bê lêkdan hin-
dek kitêb li ser mêza wî belav bûn ...Li ser serî, şiklekî
rengîn ê mezin bû zarokekî çiplaq tazî min a, an te an
ewî, demê em li jiyê wî. Digirnijî bo çi ne.. An jî bo ge-
32

lek tiştê em nabînin û nizanin çi ne. Xozî zivirîbam za-
rokekê sava .. Weye bo jîna zarokiyê ya xweş li ser lêvên
Xabûrê şîna û civaniya bejna spîndarên bilind, bê wes-
tiyan û hizir û alozî çend xweş e zarokî!

Du xîçên ne wek yek li ser deftera xwe ya biçûk
kêşan. Xîç kêşank li ber nav çavên min bilind kir û bi
dengêkî tîj mîna yê seydayê hij marê, ewê her becilkên
mela dihate mektebê û şaşka wî ya sor hêj ya li bîra
min fikir gêrrî çend ma darsa xwe nezanîba, an me
tiştêkî biçûk xelet kiriba. qet êciz nedibû ji lêdana me bi
wî heyzeranê jê dûr nedibû wek şaşika wî, şûna lêdane
wî li destên me wesa diyar dibû, gelek caran em digrîn ...
Em biçûk bûn û sira çiyayî nedizanî çi ye zarokî ...

-Nave te .. J'ıye te.. Ş OIA te "

-"Eve çı ye Xudêwo, ma em diholâ dadgehê we ne?

Erê min gotinek kiriye û ez nizanim? Ma hewceyêyek bu vê rêya reqa pirsyara? Tirsâ min ewe, ne ku nojdarê min eve dîn bit, Xudêwo sebrê bide min."

-Li min negire ... Ma pêtivî ye tu bizanî? Ez dibînim eger hema yekser astenga xwe ji te ra bêjim çaktir e. Tibla xwe ya beranî kir di difna xwe da, du mû jêkêşan. Destê xwe bikaxeza li ser mêzê paqij kir ...pêlên kenyê danpeyek û bi kotekî min şıya kenya xwe de bix-endiqînim, ma kî nabêjit ew da wê xolîdanka şûşeyî ya çı şiv in warên binkên cigara û zilkên şıxa tê lê nediyar, di min werkit û têr xebera bêjit, eger keniyê min derketiba.

Ewî zelamê li beramberî min got:

33

-Belê ... Belê ... Zaroyê min ev pirsyara zor pêtivî ye bo nojdarê derûnî, ds harîkarya wî bikî bo çareserkirina nexaxê xwe û nojdarên dijî hizrên bavlovî, ewê şalê dihebînin

Ez nizanim çewa di wê gavê da ev nav e hate bîra min: Karbov, Ereb Şamîlov ..Erê ez pirsyara ûştê zîyana Karbavî di palewanya cîhanî ya setrencê jêbikim? Ne,ne. Hewce nîne çınkı ez baş dizanim kes li cihê xwe namînit hemû jiyê xwe eve yek e ji tiştên siruştî di jînê de. Ew çıma ez ji çêweyê Şamîlovî têr nabim li xwendina destana "Kelha Dimdim"? Ew çıma wêneyê qaremanê wî " Xanê Lepzêrrîn" ji pêş çavên min naçit?

Xwezî min zanîba nihênîya gazîkirina wî bo min, erê ev nojdarê derûnî dizanit çi ye nihênîy gazîkirina wî bo min çaxê hût ji avê derdikevit û bo ezmanî difirrit?!

-Kurdo şimdîn kerîm.

-Çi...Gerdûn?

-Kurdo ..Kurdo ... kef, u re de, kurdo

-Erê, navê te neyê xerîb e? Anku ... Anku ne piçekî giran e?

-Ne, navekî sivik û sanahî yê tine di gel min bêje Kurdo, Kurdo û bînê çendê xweş e. Mina noke baş ya li bîra min e ew roja se13ydayê amadeyê bi diltengî ve ji min pirsî:

-Erê çi ye ramana Kurdoyî ...Ho ...Ho Kurdo!

Ez girnijîm û bi rêzgirtineka mukim min gote:

34

-Her mîna bersiva te, eger yekê ji te pirsî çi ye ramana Ye' rubî seydayê min yê birêz.

Evî seydayê min hej pirsyar û gengeşên min nedikir. Ya rast jî ez di dersa wî da serkeftî bûm. Ez dibêjim evê çendê jî mêşkê wî diêşand ...Nojdare der û nû jî dilê xwe bi axaftina min ne vekir, her wek saydayê amadeyê ...

-Û jiyê te?

-Sîh û sê sal û pênc heyv û çend rojek, her wekî di lîsta hukmetê da nivêsi, eger rast bit. "Erê tu dizanî, ez êş girtîyê gumaniyê me ji rastiya hemû tiştan?" Nojdarî ev zanîn e li ser wê kaxeza biçûk dinvêsîn ...

-Nuke li kê derê akincî ye?

-Li taxa Qe ... !

Erê ez bejime li taxa Qereçan? Eve ye ew navê min gulê bûyî ewe ez hatim vî bajerî û xelk hosa dibêjnê "Taxa Qereçan" belê hindêk Qereç yan lê hene, bo xwe digerin bi aşkerayî û hindêk ji jinkên wan şolên pûç dikin li bin ronahiya tavê, û ev tişt e her wesa li gelek taxên dî jî peyda dibit. Ew taxê xelkê taxa me dibêjnê "Taxên maqûl" her wasa biçûkên qereçan şalê buyaxa pêlavan dikin, pêlavên mezinên dirwînan li pişt mêzên lêkdayên mirov xwe têra dibînit û odên xweş û bîn fi-reh. Ew mirovên qet nahêlin delîve ji wan biborît bo dizîna diravê dahêrê û demê kifş dibin, wê diziyê bistûyên hindêk dî jî xwe biçûktir li peyska dahêrê ve dihêlin ...Erê ma evên hene ne Qereç in?

35

Li salên dûmahîkê me gur (bihîst) navekê wî bû, bo taxa Cezaîr dermangeha cezaîr, wênegirê Cezaîr, dibistana Cezaîr, Cezaîr ...Cezaîr ...Ev nave ji kû ve hat? Kê rakir? Erê dibit li ser xatra xudana milyon şehîda di qada ronahiyê û serbestiyê de "Cezaîr" êy an jî egereka dî ya heye?

-Te xêr e? Te bersiva min neda!!

-Li min negire, taxa Cezaîr ...

Erê tu dizanî, eger sê se'etak li ser yek baranê lêkir, taxa me di nîva avê de dixendiqit, xirr kolan û cadeyên tîjî kur hinda dibin. Zarokên taxa me xwe diêxnê bi kêfxweşî, wek kêfxweşiya zarokên taxên ava û maqûl û demê xwe di yên çîmentokirî û ronahiyên hemû reng li

diruan ..Erê nojdarê berketî tu dizanî zarokên taxa me xeber û qesên reş reş dibêjine daykên xwe. Her wesa daykên wan lê vedigêrin û delîveyeka zêrîn e ji qîzen sinêla ku baqên xwe nîşa tolaza bidin.

Rêveberê şaristanîyê soz dane xelkê taxa me, ku ji dil dê hewil bidite det bu guhirîneka mezin, belku cadeya serekî çêkin û dibit komen pîsatiyê li serê kolanê nemînin.

-Ha ..Ha ..Taxa ..Ez baş nas dikim ber destka me ya mal ji wê taxê ye, mala sêyê li destê rastê, nêzîkî"Nexoş xan ya Şagirda" navê wê Zeyneb e. Rast e nexwendewar e lê bêqam zîrek e, tu nas dike Ne, ne!

şolê te çi ye Kurdo?

36

-Harîkarê emînê pirtûkxaneyê giştî ...

Amîretekê navincî yê tomarkirinê ji çavika mektaba xwe îna derê, kasêtek kire di zikê da û da şolî ...Her dû çavên xwe yê veşartî li pişt berçavka reş û stûr bilind kirin û got:

-Da ez bişêm bi mikumî çareserkirina te bikim, divê tu rastgo bî di axavtinên xwe da û lîemî tiştan bi azadî bêjî Ka bo min bêje ka te çi ye? "U hemî tiştan bi azadî bêjê wey bo azadiyê. Baş anî bîra min, demê min ji dil dest qutayn bo Kurrê Ademê Tunîsî,demê li berahîka kurtehozanên xwe gotîye: Çinku azadî gelek mişe ye li

warên me, em dê bo dewletên dî yên cihanê hinêrîn."

Piştî min xwe dirust kiriye

bi rûniştina xwe, ez bi re-

hetiyê hesiyam:

-Eve du sal pirtir in, xewn hêrşa didin mêşkê min. Ez xewnên pîs dibînim heta ku êdî ez nizanim rehetî çî reng e! Her dem serê min geje û tijî alozîn e, ta hindek caran ez nivîstî, radibim û ji cihê xwe derdikevim û bi reve diçim û gelek şola dikim û min hay ji xwe nine ...Kabûsen pîs yên di nav leşê min da peyda bûn, li hemî leşê min diçin û tîn mîna xwînê, min dibin û tîn viyana xwe. Ez êsîrê wan im ...Hizir ke, jina min, belê jina min, ewa ez bêqam hejê dikim, min viya ez bi xend tiqînim û ez nivistî, belê ezbenî û ez nivistî min viya wê bînim derê direwin, lê dayka min got, eger ez li gel qêrrîya wê negehiştibam, noka kelexekê bê rih bu .. er wesa deyka min dibêjit, gelek caran pişyî nîva şevê tu ji malê derdike vî, demê me divên rê li te bigrîn, tu dibê gawirekê benî yê bê wijdan, em ji te ditirsîn xwe ji te dûr

37

digrîn ... çavên te dibin dû pelên agirê geş, dême te têk diçit. Tu dibê tirsek mezin, gelek mezin ... Caran zû di-zivrî û caran ta bangê sipêdê dimînî û naêy. Têştî xwe dixuyê û digirnijê û dikenê heçku qet çî ne qewimî. Nojdarê şadiyê, tu dizanê ev xewn e ji bîra min qet naçit Şevêkê min nehengekê mezin dît, ye ji rubarî derdikevit û berêxwe didit min, difirrit bo esmanî û nêzîkî ewra dibit, jê diburit, hedî hêdî bu heyva geş jê nêzîk dibit, devê

xwe yê fireh mîna şikevtê vediket û heyvê dadûrit, ew ronahîya geşa law hinda dibit, tarî min û er dû esmanî digirit, û careka dî dizivrit bo rûbarî .

...Ez hevcarê bapîrê xwe hildigrim, rêya rûbarî digrim, da wî bikujim, heyvê jê bistînim ji nişkekê ve ez gurgên têhnî yên xwîna mirova dibînim li peşya xwe û diberdin min, ez bêhemd piçekê paşve dizivrim, lê xanê lep zêrîn li min dikit qêrrî:

-Paşve neçe Kurdo ... Ez dê harî te kim ...û mezinê gurga mîna mirova diaxivit:

-Goştê te xweş e lawo ... !

Êrişekê didin ser min ... Ez di cihê da hişik dibim, pêstirk min digirt rengê min dihête guhîn, peyv? di gewriya min de dimrin, û Mîrza Mehemed li ser pişta hespê xwe yê boz dihêt û min ji erdî hildigirt û diavêt pişt xwe û min dideynit cihê ez lê dijîm ... û û hişyar di bim, ne xanê lep zêrîn ne Mîrza Mehmûd, ne hespê wî, û hêştâ dengê gurga yê di nîva herduû guhên min da deng divedin ...Ez ji nav nivîna derdikevim, jina min bi min dihesit:

-Ez hîvîyan ji te dikim. Ne derkeve!! Tu bi Xudê kî ne derkeve!! çi ye? guneha vê jina nizanit tama şadiyê çawan e?

38

Bawer ke seydayê nojdar, min ha ji xwe nîne, dema ez li zarokên xwe didim û nivînka disojim û dikevîn nav tiştên malê da û dergehên cîranan diqutim

Yek dibêjit:

-Bihêlin ..Yê dîn bûye

Yê dî dibêjit:

-Erê çima em nahavên nexoşxaneyê dînan? Ma dîn bi saxin? û pîremêrekî piştixûz li wan vedgêrit. ..

-Dê bihêlin hey mala wey nû ..Nê xweş mirove!

Erê ...Tu çî dibêjî nojdarê şadîyê?

Serê xwe her hejand, berçavka xwe êxist, deyna ser mêzê, hêj lêvên wî ji seryek ne rabûn da baxvit, zirêna telefonê ode tijî kir. Aınîretê tomarkirinê rawestand, destkê telefonê da ber guhê xwe:

-Belê ...Ez im Êfan Razî

Wey Xudê, tu çî dibêjî, gelek herîşiyê, eve ez hatim, hatim!

Şepirze bû gelek dest avêt çakêtê xwe û berçavka xwe ji bîr kir ji leza ew diçû û gote min:

-Kurê min yê li trimbêlekê daye, noke yê li xestê, piştî heft rojên dî were ..

-Ez jî dûv derkeftim, kesek li eywanê nebû, ji bilî ci-hêlekê bi dişdaşeyekî hewçikfireh, erdê eywana tuzkî

39

Şûşeyek hebka wek ewa di berika min da, min ji we mezin kirî min qesta cihê rawestîyana pasa kir.

Min bo l'we digot "Erê rast e dîn im ! Yan di cîhanek dîn de me? U ez kenîm. Hindek rêbara hayji kenyê min bûn.

Bi rastî min şerm kir, û min biryar da ka ez bi piya bi-zivirim malê, çinku êvareka xweş û fênik bû. Erê hûn bawer dikin?

Hadîse, Rîmadî]986

40

Zerî

"Diyarî ye bo zarokên bajarê Qela Dizê yê ku li roja 24.4.1974 bi firokên Iraqî şehîd bûn."

Zîqe zîqa çûçkan û bê gonahiya sava, digote zeriye dergeha veke. hindek dengên jê ne xerîb, ji navbeyna dar û barê kesk, digehîştin kakilka dilê wê berî her du gûhên wê. Dilê wê bi wan bist bistên nermîn ve hate nûsandin. Berî dangên kirasê xwe yê teys teysok, ji giyayê bêhn xweş hilgirit, gul dengê dergehê bû. Dema dargeh vekirî, ew bi çilkên xwe yê xwendîngê yê paqij û rengîn ji xwînê, dîtîn. Navçavên wan geş bûn ...

-Wey hûn bi xêr bê, xuşk û birayên min. Kerem bikin werin jor.

Ka çaya her roj bi taze hî diçûn di rêzên xwe ve, wesa bi jorî wê eywana fireh ketin, ew eywana mîna wê li cîhana ewilî ne dîtîn.

43

Dengê kewan û çûçik û bulbula

vêkra bi awazek nazik

vedigêra:

"Hûn bi xêr hatin behîştê."

Lemyayê, hîvî kire her du çavên Zeriyê yê pir tenahî, mîna çavên wê û bi vêriyeka evînî di pêşiyê ra bikit, jê pirsî:

-Berî nûke min tu ya dî, lê ez nizanim kengî û li kûderê? Ne tu bûyî ew zaroyê tenbûrvan di gel wê ûpa Kurdî, ewa strana "Heval Hevaloşkê" pêşkêşî tele-

vizyonê kirî, liNewroza îsal ?

Zerî gîrnijî û yarî bi davên pirça xwe ya dirêj kirin û bi sivikî bersiva wê da:

-Na xuşkê na, qet ez di televizyona vî warî de ne derketim... Lê min wênê xwe yê qurmicî dît, heyvên pêşesazî bar dikir bo hemî deverên cîhanê. Demê ew gulleyên giran bi min dikevtin, ez dihêram. Ez disotim .. dibûm xwelî. Careka dî destên spî, spî mîna befrê xwe di min werdikirin , ez bilind dikirim esmanî. Careka dî ez dibûm ez. Ez im şahîda li ser wêrana bê wijdana bi ser min û hevalên min yên zarok da haû. Ez jî wek we diçûm mektebe û min kitêbên xwe dikirin di cenê xwe de, min baş guhê xwe dida qelem û kitêb û şiklên xwe,
|||m

li xwendîngê, di

ez bê-qam dilşad dibûm demê

gel he-valên xwe sirûda "EY REQffi" dixwend ...

Ez gelek keyifxweş dibûm dema mamosta min, dayka min û babê min, ez maçî dikirim ...

Ji mêj were ev wêran e li me qewimî. Dibit hingê hêj hûn nebibûn yan we nedizanî mekteb çi ye!! Yan jî hindeka ji we bi şadî, li baxçên xwe yarî dikirin ... Wey bo wê wêrana bi serê me da hatiye ... Wey babo wey .. !

44

"Hinde" xudana neh salan viya baxivit, xwe û hevalên xwe bo Zeriyê bidit niyasîn, lê ewê ew delîve bo nahêla, dê bêjî, ewê dizanî çi di dil da ye û çi divêt û gote wan: Ez we hemîyan nas dikim ...Ez dizanim hûn wek min

şehîd in. Min kuştin û wêrana mekteba we dît û ew tirs
ketî dilên hejar û jaran. Ez dizanim dêbabên we heta ge-
lek şevan neşên

xewê bibînin. Hûn her dê li nîva di-

lên wan bin. Lê demê hûn sera wan didin, dê bêhna wan
hêt û xemên wan dê birevin, demê geşaûya asmanî di
çavên we ra dibînin.

"Sevsenê" xudana keziya zer, bi keyfaxivitina wê birî:

-Ee ..ee ..eerê ezê sera dayka xwe dim û maçî kim û em
herroj?

Zeriyê her du destên xwe dirêj kirin alekên wê yê sor,
çend çipikên xwînê jê malîn û gotê:

-A,A,Axuşkê

a.

-Tu sera mala xwe didî

-A, ez sera wan didim, dema ez xerîb bibim û her car
ez bo xwe qevdek "NÊRGIZA" ji wêrê dînim.

Basimî şînwarên rondikên xwe malîn û gote Zeriyê:

-Tu ji kû derê yî?

Keyfekê xwe li nav çavan da:

Ji pişt çiyayên befrê girtîn, nîzîkî kehniyên sar û zelal,
ji "Qela Dizê" ..

45

Nizanin ji kûve dengê nizm hat û giftûgo li nav beyna
wan birî:

-O Zerî, zarekên mektebê bibe ser rûbarî, da xwe
bişûn, paşî çilkên nû bide wan, baş e zerî?

-Belê, belê bi rêzkirtineka mikum Zeriyê bersiv da ..

Û li pêşiya wan diçû bo gîrnijînê mala xwe li ser lêvên wan deynabû.

Mûsil 1987

46

Şeva Baranê

Ma çî ji baranê xweştir heye?

Te serê xwe bi tiblên xwe şeh kir, destê rastê bi simbêla dayîna xwarê û ji odê derketi û te dergeh girt, kilîl bi depê bê reng ve helawîst.

Te berê xwe neda wê eyina mezin ewa keti beramberî te. Tu dipeyska da çûyî xwarê ,hewce nebû dergehê vekî, kî tek wî bi xwe li taq bû.

-Pa bêhna axê xweş e piştî baranê!

Te mêhka serî ya çakête xwe girt, her du destên xwe kirine berûkên pantol bi tinê te di gel xwe îna.

-Dê rêvin bî, evê gewir jî bibe ...

-Eve bes e, ez gelek gîro nabim. Deh diwazde pêngavek li ser teqne, te havêtin tu gehiştî lêva cadê, te berê xwe da çiyayê bilind ê mit û te ji dil bayê baranê helkêşa.

-Aah pa xweş e! Ronahyên cadê helbûn û baran li ber direqisî. Bazar di xew çûbû. Tu kefxweş bûyî bi çibkên baranê ew ên silav dikrin pirça te ya sivik. Heta serê bazarê tu çûyî, boriyê alê dî û pê da hatî xwar ew qemara reş sê-çar caran hat û çû ...Tu li ber wê çayxana biçûk

49

rawesta yî.

-Bila sivik bit. Te av vexwar û tu rûniştî ser wî textê ji

der ve, ewî getê xîvetê yê li hindav serê te vedayî, tu ji baranê bê bar kirê, hindî tu şîyayî te her du pênên xwe dirêj kirin ...

-Tu bi xêr hatî xalo.

-Xêrandar bî .

ez jî te çaya xwe netêkvedayî, ew trum-
bêl e beramberî te rawesta, te piyala xwe bilindkir û firek li çayê da.

-Tu çend hej çayê dikî hey malnexirab!

-Û hej xwîn şîrîna xwe jî dikim.

-E heme dê newe vîya nebêjê! Dê vexwe, vexwe hêj sar nebûyî

-Bila sar bit, dê germ key ve eynika min

Wela babo xweş hejê kiriye!

Tu kenî û te serê xwe bilind kir, ew mirovê di gemarê da rûniştî, rik û rik li te difikirî. Te du derhem da nav çayçî û te gotê:

-Tu bi xêra xwe yeka dî jî naînê?

-Wey ser çavan xalo ... Te ew mirove hêla wesa û êdî berê xwe neda alê wî. Lê ewî neşiya xwe bigirît û bi kerb ji trumbêlê derkeft û qesta te kir, bi dengêkî şidyayî gote te:

-Tu bi çi dikenî? Çayçî piyala te deyna ser wê mêza asinî ya sê pêyî, hêdîka te têkveda ...Ewî neşiya xwe bigirît:

Ma tu ke rî te hay ji min nîne? Te kevçik ji piyalê îna

50

Derê te kire di bin kaskê da bi nermî gotê:

- Tu bi çî heq vê pirsê ji min dikî? Kêm mabû da çavên wî ji gogilkê êne der, destê rastê dirêj kire te û got:

-Çinkî tu bi min dikenî!

-Ez bi te dikenî?

-Erê., Erê.

-Ma ez te nas dikim, da bi te bikenim?

-Ma yek heye ji vî bajarî min nas nekit?

- Lê ez ne ji vî bajarî me.

Demê te we gotiye, sist û sar bû. Bi dengekî nizm û nerm gote te:

-Pa tu ji kîj bajarî yî?

-Bi bişkurîn ve te gotê heqê vê pirsê ji te nîne, ma ne weye?

..... Te destê xwe bi berûka xwe û pakêta cigara dîna derê û yêk jê berdayê, paşê te pakêti ber bilind kir:

-Kerem ke ...

-Ez vî tuxmî nakêşim. Piçekê bêdeng bû û hizreka dî ji te kir û yekser gote te:

-Hîvîdar im tu êciz nekîrbî! Te berê xwe da dêmê wî yê esmer û carkadî tu ji dil kenî. Te çî negotê ... Te çayek dî jî vexwar. Te hûrde de bidê çayçî, te gotê:

-Derhemek te mal li min xal.

51

- Çiyê min nemaye li te xalo. ya dûmahîkê ji kîsê min e...

-Bijît! Tu rabûyî û te rêya xwe girt, demê tu gehîştî termên telefonên bi rêz , te viya telefonekî bo mal bikî, lê

hat bîra te, derhamvi te nemane. Cardî tu kenî û te serê
xwe bilind kir esmanê tarî û tu ji bayê sarê baranê sil
nebûyî û di girnijî ji diL.

-Babo bi Xudê baran xweş e !

Dihok 13.3.1990

52

Şehyana Çûçikan

Min hest kir, giya ji wan ra girnijî, demê lê bûyn mêh-
van.

T'irojkên roja geş silav li çiq û belgên darên bilind di-
kirin.

Demê enîşka xwe danî ser rehnê wî ew zelumê di
dişdaşê pîs ra berze, xwe nîzîkî wan kir.

Diviya wan bi awirîyên xwe bixut. Du, sê, pêngavek di
navbeyna wan da bûn, demê ew li

ser giyayî rûniştî. Kerbên giyayî vebûn û tişteke got, li
pêşiyê min nezanî çî got, lê dema ewî

destê xwe dirêj kiriye gulekê da bikit, giyayî qîre kirê:

-Çima tu hatî vir?

Ewî guh neda, heçku çî gulê nebûyî an ji zimanê siruştî
nizanî.

Mêrkî stêrka xwe li nîva laşê wê jinka biyaniya keyf-
xweş bi çavê rojê û giyayê Mûsilê jêhatî girt.

54

Gelek keyfa çûçkan bi wan hat, biryar dan şehyanekê ji
wan re saz kin.

Dest bi stranên xweş kirin. Revdên çûçkan ji darên
nîzîk qesta wan kirin.

Çûçkê got:

-Xenîn!

Û serê xwe bilind kir bo çavê rojê.

Çûçkêgot:

-Evî mêrkî halê wan nexweş kir. Çi ji wan divêt

Xwezî ji wê rê çûba. Ev kesên hosa bi çavsorî zêrevanî li xelkê dikirin, min nevên.

Te divêt ji vir derêxin?

-Di cih de ez ê maçekê bidime te.

Çûçkê dest bi awazeka nazik kir û li çarkoşeyî kesk firî.

Revdên çûçkan gehiştinê û bi nizmî li dor mêrkî difirîn.

Mêrkî viya wan biêşînit, lê zêrevanê baxçê her zû amade bû:

-Bi hêle şehyana xwe tamam kin. Tu dîn î, har î?

-Şehyana xwe? Wasa mêrkî lê zivirand.

-Belê şehyana bi her du evîndaran.

Di wê gava kurkî keçik maçî dikir, çûçkê maçek da hevalê xwe.

Min hest bi xweşiyeka mezin kir, mîna rûbarekê stranan bêjit, lewa hêdîka min jî strana "lê lê gulê, lê lê" bo xwe vedigêra.

Mûsil 1989

55

Zarokê Befrê

Her du çavên te zîq lê bûn. Te xwe xweş kir bo axiftinê, lê tu bêdeng mayî û bi hêbetî têfikirî, li bin barê pişt lê qoskirî.

Befir ji nav kenga wî bilintir bû. Binê telîsî vî ruyê befrê

dike vit. Dêmê wî sor bû, mîna sêvên ravîna. Kumkê wî,
sêr û guhên wî veşartî bû.

-Ma tu ji Xudê natirsî, hey mal ne xirab?

Eve bûn peyvên te diviyan bêjî babê wî, lê te daîran,
mîna gelek tiştên tu wan heyaman da dîrî.

Dilê te bi ezman ket û gote te:

-Xwe neke pêkenînkê wî. Da bêjite te eve ye jiyana
me, divêt ji nuha fêrî şolî bit. Tu yê kudanên me dibînî,
kî nabêjit vê gavê, yan gavê dî, ez dê çim û çim, wek
dûkêla cigarê. Erê ma kî nabêjit, dê bêjite te:

58

-Hema hûn sax bin, bo ewî seyê mezin, hey ser şorîno!
Dê bêjit dê wêrit we bêjit. Çiyayî hemî tiştan dibêjin. Ji
te borîn, lê te neşiya çavên xwe ji barê wî yê giran vekî,
heta nuha1ê ew daîrayn.

16.3.1988

59

Heyhat

Devê wî bi lûliya henefiyê ve nûsa bû. Pirça wî bû xwar
û enî lê hinda kirbû

Demê serê xwe rakiriye ez bo girnijîm û min qesta wî
kir, di cîhê xwe da rawesta û nelivî:

-Bi Xwedê min çu nekirîye, bes min av vedixwar!

-Netirse xalo, hêj vexwe.

-Hey, tu Kurdî dizanî.

- Ez Kurd im wek te.

-Panê eskerên vêrê bi Erebbî diaxivin!

-Ez jî wesa di gel wan diaxivim.

-Dê bî hevalê min?

-A...

-Navê min Heyhat e, subehê siharê ez ê mastî bo te bînim ...pa navê te çi ye?

62

-Mihemedê.

-Navê babê min ji Mihemed e.

-Silava lê bike başê?

Serê xwe nizim kir erdê û du rondikan dan pey yek û bi alekên sor û nazik hatin xwar:

-Par çû û hêj nezivirye.

-Bo çi?

-Ez nizamim, lê dayka min dizanit. Hevalên wî dibêjin, gelek hej axa dikir.

M!n rondikên wî malîn û maçî kir, bi dengekî hejar gote min:

-Xwezî te şiyaba hindê "şekir û çayê" bo me peyda kî!

-Bilanê.

-Heyhat, Heyhat weke mal dayka min tu diyê

-Bi xatrê te, eve xuşka min e, ez ê siharê masû bo te bînim.

-Bi xêr biçî Heyhat ...

1988

63

Seredan

Bêyî dergehî biqutit, da di jor ve û destê xwe bo dirêj kir.

-Eve kî ye?

-Bibûre, jînik li cem me naçin destên zilaman ne xasim
yên biyanî, kerem bike!

Bi şkestî destê xwe kêşa, viya girnijinekê li ser lêvên
li ber tehra tavê kelişîn, biçînit, da şerma xwe veşêrit,
lê neşiya.

-Te xêr e?

-Ma tu pêşiyê nahinêrî çayekê?

-Eger eve çayxane ba. li ser çavan. Berê xwe da nav
çavên wê yên nerm û law. Çavên hîz, bi tam sarîyeka
aşkira bi singê wê ve helawîstin. Ew rabû "dûlaba asinî
vekir, deferek jê anî der, vekirî da vi mêrikî.

Temaşeyî defterê kir.

66

Nav:

Kar:

Egera seredanê:

Mêjû

"Diyar e ev jin e bi yek carî ne wek ya berê ye"

Defter da yek û li ser mêza di navbeyna xwe û wê da hê

la:

-Ya rast min diviya bibit seredaneka nasbûniyê ...

Ha ...Ha, hah

-Tu dişêy axivtina xwe binivîsî? Gelek tengav bû,bê
ser û ber û xûhday ji odê derkevit û " bêriya reş, li ser
mêzê hêla.

14.7.1988 Bêgova

67

Mesîn

Demê sîrên ji dergehê hatî, yekser her du bezên me sînî
bi çavên tijî kinîşt berê xwe da wan.

Yekî lûlî girt, yê dî destik.

-Berde kuro berde!

-Pa bi Xudê tu bimrî bernadim.

-Ma ne şevê dî te bo dagirt, îro dora min e.

-Dê here, min bawer ne kir ez dê ji berî te bigehimê.

-Çu mirovek zinx î tu, dê bigre, bigre.

-Mala minê bêhna gulavê ya ji te difirit!! Du sê pêngavan pêşve çû
"Erê bi rastî eve ez im"?

-Kerem bike ezbenî, kerem bike.

70

Li pêşiya wî çû.

Ew di dîv da.

Sê çekdar di dîv wî da.

Mes!n li cihê destavê hêla bi devekî beş zivirî.

Ew çû jor.

Her seyên din, wesa nizM wî bûn

Ku bê minet, di şiyantir

û fisên bihijmêrin.

Çavên wê koma nîv mirovên li hîviya êmîşê rojane. li

wê şanoya rojane bûn.

Awiriyên wan, bê deng digotin:

-Erê ma eve jî mirov in?

1988

71

Wexer

Simfoniya şemendefêrê hêj wek xwe ye, awaza xwe ya bê guhurîn "çik. ..çik ...çik ...çik" bi dilê xwe ya lêdidit. Her çende pêlên westiyanê û xewê li dor min dizivirin, lê çavên min, hêştî nîvekirî ne, mijûlankên boşên dirêj, caran diên xwarê û yên binî .diramûsin û jêk vedibin. Ew kovara di dest min da, hêdîka min deyna ser wê mêza spî ya biçûk li bêr singê min. Min ditûre da nekir, dirandî bû.

Bê rêz deziyên wê hatibûne xwarê.

-Festîvala îsal dê xweş bit, pa ne?

Min viya, tiştêk dî bêjim, lê peyvan dan ser lêvan:

-Hemî rojên min di gel te festîval in.

-Bi rastî?

-Bi serê difna te ya delaL.

-Dê min bêyî nav daristan û tavgên bajêrê û wan bazarên Mûsilê, yên tu dibêjî, çavê rojê na bînin û tameka taybet hene.

Mane?

74

- Ser çavan kakilka dilî.

Erê, ez dê çi bêjmê, demê birayê min yê mezin rahêlit qêriya di gel jina xwe, bêyî hoyekî berkeftî, mîna her carî. Yan jî demê zarokên wî dibînit û nan di destan da kolanê

Erê, erê, ez dê bêjmê eve festîvaleka gelek taybet e!

Kî dibêjit, dê şet xwe nizim kit "henefi" ya bi tinê li

malê, demê spêdê dest û çavên xwe bi şût.

-Rast e dayka te hej min dikit?

-Belê ciwanê, lê bi serê te, kes mîna min hej te nakit qet.

Erê, eger serê xwe bişût, dê şêt xwe li ber qîj qîja pir-
êmizî û tengiya wî erdê bin peyiska, ewê em ji qasta di-
bêjînê "SERŞO" bigirit. Hîvîdar im serê wê bi wî banê
reşê nizim nekevit...

-Hê ..Hê .. rabe em gehiştîn.

-Belê, Belê

-Sibahiya te bi xêr.

-Çi xêr li binê vê berriyê heye?

Nizanim gava destê min gehişt perda pencere u min
veda. Davên tavê bo dar qesp ên bilind girnijîn, û dibit bo
xewna min jî..

1982 Besra

75

Ew dil û We got:

-Ez dê navê te li ser darê nivîsim.

Min got:

-Ez dê navê te li cihekî dî nivîsim.

-Dê li kû derê nivîsî?

-Bo te na bêjim.

-Tu bi Xudê kî bêje!

-Dê di dilê xwe da nivîsim.

-De veke û binvîse.

-Nê ji min dûr e.

-Ma ne di singê te da ye?

-Ji hestiya pêvetir çu dî têda nîne.

78

-Pa ka dilê te?

-Yê li serê çiyayekî bilind û eve ez ê çûm navê te lê binivîsim.

-Dê min di gel xwe bibî?

-Ka destê te ewana min ... !

Mûsil 7.1.1990

79

Eve kî ye?

Eve kî ye?

Heta vê gavê jî, ez nizanim .bo çî min neşîya, çavên xwe ji dêmê wê yê pirr birînên veşartî vekim.

Ew her du çavên şînên tijî jan, keziyên zerên têk alizî û tijî toza bîstanî, tu dikêşayê cîhaneka taybet...

Dangên fîstanê hinarî yê bê ser û ber, diketin ser her du kitên şimka reş. Destê rastê deynabû bin dewlikekî biçûkî duhnî, destê çepê jî li ser dergivanekî baş şidandi bû.

-Eve kî ye?

Bê deng te gote xwe.

Ne dût e, eve ji xerdel û siyanîda bihara mirina" RE-LEBCê" vere st bit.. dibit serû sîmayê wê yê damayî evê hizrê pesend dikit. Belê pa ji kiras û fîstan û rapêcana wê diyar e xelkê vê deverê ye. Ne dût e hema ya vê deştê bit.. Xwezî min zanîba çima ho ya mit û damayî.

82

Ma kî nabêjit çw Ê ev zarokê wê yê ser qijavij, ne ji nêçîra ENFALEN REŞ rizgar bûye û hemû kes û karên wê, bi saxî li bin girên axa şefelên har û didan. çiq. Li biyabaneka bê xweyî û xudan. A.. ave jî çêdibit. Xwe zi min zimanê kovan û janan baş zanîba, da min çîroka vê zeriya dêm payîzî zanîba!

-Bê zehmet kirya we ... !

Dewlik deyna di danga xwe da û hêdîka destê xwe kir di paxla xwe da û çizdank anî derê û dînarek asinî kir di destê şagirdî da. Her du çavên kurrê wê bi hêbetî man li wî dînarî. Xudê dizanit ka eve çend e vî zarokê dînarek nekiryê di destên xwe da û wek zarokên xelkê dîtir çu tişt bo xwe nekirîne.

Demê Koster gehîştî avahîye SÎXURA. Erzinka xwe ji ser sîngê xwe rakir û berê xwe da dîwarên wî yên bi nivîsînên Kurdî xemilandî û hêdî hêdî pişikîneka nerm xwe li nav çavên wê da û gote zarokê xwe.

-EVÎAVAHÎBABÊTEDAÎRA

DAWO .. !

Zarokê wê got:

-EZ TU CARAN JI BÎR NAKIM O DA !

2.8.1992. Dihok

83

Naverok

1. B.a1ûşa şek!rê:
2. Sibe bihar de girnîJlt..
3. Mirina Serfıraz
4. Seatek li cem nojdarê şadiyê

5. Zerî
6. Şeva baranê
7. Şehyana çûçkan
8. Zarokê befr
9. Heyhat
10. Seredan
11. Mesîn
12. Wexer
13. Ew û dil
14. Eve kî ye

84

85

Hesen Silêvaneyî

Ew li sala 1957 li başûrê Kurdistanê, li gundê Tirkija, nêzîkî Zaxoyê ji dayik bûye.

-Li dest pêka sala 1980 dest bi nivîsîna kurdî kiriye.

-Helbest û kurteçîrokan dinvîsit.

-Li 1993 Dîwana xwe "Hozanên Sava" bi tîpen latinî çapkiriye.

-Li sala 1987 kurte romanek nivîsiye bi navê " Gulistan û Şev" lê ne çap kiriye.

-Ew di warê wergerê da şehreza ye. Komê çîrok û helbestên kurdî wergerandine zimanê erebî û li rojname û kovaran belav kirine.

-Ew li Duhokê sekretêrê Yêketiya Nivîskarên Kurd e.

-Endamê desteka nivîsîna kovara "Peyv" e.

-Nivîskarê kovara "Metîn" e.

86

Spas bo harîkariya:

- Babê Rastî.
- Hesên Koxî.
- Hunermendê hêja "Guhdar Selahedîn".
- Mamosta Xalid Xalid Koçî.

Hesên Silêvaneyî

87

The Sweet Bread

Kurdish Short Stories

By Hesên Silêvaneyî

ISBN: 91-87730-66-9

APEC

BAVÊ NAZÊ

Wêşanên Jîna Nû : 10

Edebiyat : 1

Çapa yekem : îlon, 1986

Adres:

Jîna Nû Förlaget

Post Box : 240 12

750 24 UPPSALA

Postgiro : 50 37 99-9

ISBN: 91970747-56

Diyariji bo:

Herdu xivşên min; Nazê û Dariya û
ez hêvîdarim, ewê xwe di "Xoşnav"
de nebînin.

Bavê Naze

NAVEROK

Pêşgotin 7
Navê Min Xoşnave 12
Wê Kengî Bê 19
Xaniyê Vala - 23
Rûreş .. 28,
Hêsir û Baran ... 36
Windayo 38
Serpêhatiyên Kalo
Şaîroko 48
Serxweş 53
Bîstikek Bê Rûmet ., 60

PÊŞGOTIN

Heger em bala xwe bidin dîroka (mêjuwa) wêjeya Kurdî ji dema E.Herîrî ta roja îro, wê tiştek tenê bi xurtî li ber çavên me diyar bibe. Piraniya cihok (rûbar) û çemên ser riwê zemîna wêjeya Kurdî derhatine ji kanî û çaviyên şîrî. Lê gelo kengî dar û mêwên prozê (nesrê) di gulistana wêjeya Kurdî de peyda bûne?

Bersîva vê pirsê, weke hûn dibînin, ne mecala me ye, ku di vê derheqê de bi awakî fireh bidim, lê di bawerîya min de, heger em îstegehên giring ji jiyana peydabûn û pêşveçûna proza Kurdî bi nav nekin, emê nikaribin texmîn bikin rola efrandinên Kurdî yê teze û ne karibin jî cî û nerxê lehengên çîrokên Bavê Nazê nasbikin.

Weke diyar e, mêjuwa meşandina dîrok û çîvanokên Kurdî, bi zarava Kurmancî, ne ewqas kevn e, ew rehê xwe davêje destpêka sedsala bîstan. Lê gelekî mixabin efrandinên wan salan, ta niha nebûn babeta lêkolînek serbixwe

û tu kesî ev quncikên tarî ronî nekiriye û ne vejandiye.
Ji ber vê yekê, meriv nikare navên hîmdarên ewil jî bîne
ser zimên. (1)

Ji xeynê vê yekê, heger em li qonaxa salên sî û çilî binêrin,
bê guman, meriv kare navê damezranerekî proza
Kurdî toremendî bêje -Ereb Şemo (2), yê ku ta roja îro jî,
tê jimartin weke mezintirîn nivîskarê Kurd ên ku bi zarava
Kurmancî efrandinên xwe weşandine û heger hineka
berê wî jî kerpîçê ewil ê hîmê proza Kurdî danîbin jî,
lê tu kesî weke wî bi şarezayî û zanebûn çim û kelemên vî
hîmê tekûz nekirine.

Piştî gulvedana efrandinên Ereb Şemo û jindariya rehên
proza wî yî toremendî, gulçînên din kifş bûn di zemîna
gulîstana wêjeya Kurdî de. Lê piraniya wan negiha rehê
xwe berdin, çilmisîn yan jî berê xwe negirtin.

Keda mamosteyê mezin, Cîgerxwîn "Cîm û Gulperî"
ku di sala 1948-an de derket, hêviyek mezin di xwe de nimandibû,
lê gelekî mixabin, di gel ku şitilek teze bû û di
gel ku hatibû avdan bi hêsir û xwîna bikêrhatina gotina
Kurdî î bedew, bû weke darek rehên wê li tehtê rast bîn.
Vê yekê, ji me re kifş kir, weke berî niha bi demek dirêj
ji gelê din re kifş kiribû, wekî ne her cenan û avçiyên wêjeyê
her şkaryî li her zemînê karin şîn kin yan darên xwe
têde biçînin. Bi kêrhatin û şarezaya Cîgerxwîn î herî bilind
di warê şîr û helbestan de xaya û eşkere bûne di warê
zanebûna şêw û metodên nivîsandina prozê. Şaxên herî
hêja jî di vê "dora wî yî proze de" man ew şaxen şîrî yen
pir bedew.

Di salên 50-î de, ji nav wêjezanên Kurd, yen ku zarava kurmancî xemilandin bi bihokên xweyî tamxweş, dîsa navên nivîskarên Kurdên Sovyet eşkere dibe, weke Heciyê Cindî, Casimê Celîl û hinên din. Lê gelekî mixabin, efrandinên wan kêmnas in ji piraniya xwendevanên Kurd re.

Di salên 60-î û 70-î de, navên nû di nav Kurdan de derketin, yê ku xwe, di warê wejeyê de, li prozê kirin xwedî. Divê ku bêjim jî, wekî ev qonax tê jimartin weke qonaxek teze di pêşveçûna çande û wêja Kurdî de ji ber gelek sedemên objektîf û subjektîf ku di tevgera azadîxwazî Kurdî de peyda bûn û hiştin bintara civaka Kurdî bi xurtî bê hejandin. Bi ewakî ber bi çav, kovar û rojnamên Kurdî yê vê demê xwîn ajotin laşê proza Kurdî, hêza zimanê wêjeyî (zarava kurmancî) şidandin û xurt kirin. Lê dîsa hemû uştên gulvedana prozê, çîrok û çivanokên toremendî peyda nebûn. Mirov kare foi kurtî rewşa efrandinên vê demêyî hindik bi nav bike wekî tenê bi rûçkên xwe nêzîkayî li qalib û formên çîrokên modern dikirin. Ji nav efrandinên vê demeyî kem, meriv kare van navan bijmêre; Çîroka "Kal" a Dilar, "Kirase sor" a Siyamend; "Mirina Xuşka Min" a M. Bor û hinên din.(3) ' Yekîtiya Sovyet jî di vê demê de navên nivîskarên nû eşkere dibin weke Seîdê Ibo, Emerîkê Serdar, Baboyê Keleş û hwd.

Weke me diyar kir, cihokên nuh û teze dehatin vedan û kolan di zemîna wejeya prozên renga-reng, lê ta roja îro rûçîkên efrandinên proza Kurdî ji kêmasiyên mezin xelasnabin

çi di warê lêkirinê de çi di warê babet û metodên nivîskariyê de û çi di warê ziman de. Bi baweriya min ew jî ji ber van sedeman e:

Kêmnaskirina nivîskarên Kurd ji wêjeya Kurdî ya klasîkî re; kêmmarîfeta ji zargotin û zaravên Kurdî re û kêmnaskirina wan ji şêw û metodên nivîsandinê yên gelên cîhanê yên din re. Ev û gelek sedemên din ên obyektîv hiştine gulîstana proza Kurdî ya ser zarava Kurmancî bi şûnde bimîne û avakirina zimanê Kurdî yê wejeyî û yekgirtî bi çetinî bê lidarxistin.

Nivîskarên ku bi Kurmancî van salên dawî de efrandinên xwe derdixin, ji aliyê hêz û naveroka nivîsandinên xwe bi ser sê celebên tînan cudakirin: Celebek hîn pala xwe dide ser kendal û kaniyên zargotina Kurmancî û ji zêdetir naçe; Çelebek jî berê xwe dide çaviya êş û xemên jiyandî û celeba dawî jî hewldide hûnerên jiyana Kurdî bi hewesek vergerandinê (tercume) derxe, bê ku dêmê Kurdayetiyê bi zelalî bide xuyakirin.

Gava em bidin ser şopa Bavê Nazê ya ku li ser dêmê wêjeya Kurdî hiştiye, ji dema çîroka wî ya yekemîn "Navê min Xoşnave" sala 1974 ta roja îro, emê raserî dewsa destê hostakî çalak bînin. Çîroka "Navê min Xoşnave" ta neha zêdeyî şeş çaran di kovar û rojnamên Erebi, Kurdî û Sovyetî de hatiye weşandin. Ev yekê han tenê rastiyeke din eşkere kir: Çîrokê vîza xwe ji xwendevana stend, jiyana xwe di nav gel de dît. Piştî çar salan, Bavê Nazê Romana xwe "Çiyayên bi xwînê avdayî" derxist. Ev roman bû ciyê şanaziyek mezin ji me re, ne tenê ji ber ku romana

kurmancî ya yekemîn bû (ji der efrandinên kurdên Sovyet)
lê belê ji ber asêlêkirina wê ya tekûz. u her wiha ji ber
"giringiya wê di hişiyarbûna Kurdan de"(4); ji ber kû
"dike Kurd çalakî tekoşîna çînayetî û rêzanî ji bo bidestxistina
mafê mirovayetî bike"(5)

Weşandina vê romanê bi zimanê rûsî sala 1982'ya di
10

gel roman û çîrokên nivîskarên kontînênta Asiya yê bi
nav û deng, jiyaneke nû da romanê.

Di van çîrokên teze de, Bavê nazê carek din bi rewak
dewlemend û hêzek têr qinyat xwe şanî xwendevana dide.
Bi derketina van kurteçîrokan ne tenê şikarta Bavê
Nazê di gulîstana çand û wêja Kurdî de geş dibe, rengê wê
xweş difoe, lê her wiha pê surrek bayê hênik li pel û şaxên
temamiya gulîstanê dixê, ber û fêkiyên çande pêre pêre jî
dighên.

Ridwan Elî

1) Bi zarava soranî yekemîn çîroka toremendî di sala
1925'an de hatiye weşandin, ewjî ya Cemîl Saîb bû foi navê
"Eway li xaw bînim"5<Min ew di xewnde dît".

Biner: Marûf Xeznedar: "Kurte-dîroka wêjeya kurdiyî
teze" Mosko. 1967 (bi zimanê rûsî) r. 142

2)Pirtûka ereb Şemo ya yekemîn di warê proza toremendî
de di sala 1930'î de derket, ew jî pirtûka "Şivanê
Kurd" bû.

3) Binêr li kovara "Çiya" jimarên 1-8, çapa teze bi tunê
pirtûkê. Ewropa 1974. Civandina Hemreşê Reşo.

4)Pêşgotina M.S. Lazarev ji pirtûka "Çiyayên bi xwînê

avdayî", çapa rûsî

5)Li wir jî

11

Bi adetî, yê ho hindik dizanin
geUKî dipeyivin ûyên ko gelek dizanin
hindik dipeyivin. (Ruso)

Heke mirov ev herdu tişt danîne
ber hev, dibîne ko tiştê ko pê dizane,
ligora tiştên ko pê nizane, gelek hindik
e. (Fontnêl)

NAVÊ MiN XOŞNAVE

Nayê bîra min kengî min xwe naskir, lê xweş tê bîra min
xew nediket çavên min, heya diya min çîrokekji min re negota.
. . Bi riya çîrokan ez hogîrî odê bûm. Ev oda ku bi şev kesên
mezin bi guhdarî kirina stiran û çîrokan şevbêrkên xwe têde
dibuhurandin.

Lê mixabin rûniştinali wirji me zarokan re qedexe bû. Dîsa
jî her û her me hewlê dida da derbas bin hundirê odê. U
her car xulamê axê bi guhên me digirt, em diqewirandin. Lê
ku dihat û Xwedê li hev tanî, bi fen û fûtan em derbasî hundir
dibûn. Ciyên me ji şûna şekalan bûn. Lê dema em diman ji

12

derveyî odê (ew jî gelekî pir bûn) em radipelikîn penceran,
da ku em çîrok û çivanokan bibihîzin. Lê camê nedihîşt deng
bê me. Lomajî rûhê me, qasî ku ji xulamê axê diçû, hewqas
jîji camê diçû.

Di vir de, divê ez rastiyê bêjim; heger em deynin ber carên
heval û hogirên xwe, ez gelekî kê mî caran li ber pencerê dimam.

Ji ber ku bavê min qedrê wî li gund hebû yek carna ji min re dihiştin ku ez şevbêrkê li nav mezinan bikim. Tevî ku di odê de ez di nav şekalan de û nêzîkî ciyê xulam rûdiniştim jî her û her ez kêfxweş bûm. Li gor vê bextiyarîya min çî qasî heval û hogirên mi ji mi diqehirîn. U çavên wan bar ne dibûn!.. Lê min ev tişt di ber guhên xwe re ber dida û xwe di cîhana çîrok û destana de ji bîr dikir.

Heger mezin bi ode bûn, em zarok ne kêrî wan bûn. Oda me garsîna nava gund û teyar û zolîkên dora wê bûn. Heger çîrokvanê mezinan nêzîkî axê rûdinişt, lê ez çîrokvanê zarokan di nav wan de, min di ciyê xweş û baş, bi şahnazî û payetî rûdiniştim. Lewra min xwe bi zanebûna çîrokan di ser hevalên xwe re digirt. Di nav wan de hawayê dengbêjên mezinan dikir, xwe bi vî alî û wî alî de dihejand, dikuxuyam da ku deng zelal bibe û min çîrokên ku di odê de bihistibûn ji wan re digot. Carna jî min hin çîrok ji cem xwe çêdikirin. Bi hawakî ku min hinek ji vê çîrokê, hinek ji ya din digirt û bi hev perçîm dikir. Lê hevalên şareza "dizîtî"ya min nasdikirin û digotin: "Te ev ji wê çîrokê û ev jî ya han biriye." Bi kurtî, qulopaziya min nediçû serî.

U rojekê ji rîqjan, dawîya havînê tişteki ku hîç ne li ser bala min bû bi min re bihurî. Bavê min ji mi re got;
-Divê ti herî bajêr, ji bû ku ti têkevî mektebê.

Min navê bajêr bihistî bû, çîmkî mala birê min ê mezin li wir bû. U bêyî ku ez zanibim çîma, lê tim û tim navê bajêr li cem min bi navê nanê firnê, şekir û helawê hati bû girêdan.

13

Lê bêxwediya mektebê çîye?

Tu di bê qey bavê min di dilê min de bû, dema peyîvî:
 -Kurê min mekteb mîna odê ye, lê tenê ji bo zaroka ye. Di vir de ji çîrokê odan xweştir dibêjin.
 Ji kêfa, min xwe negirt bi bazdan ez derketim nav gund û min ban kir:
 -Ezê herim bajêr. . . Ezê herim mektebê û di nava xwe de mi digot "lê bêtirs ezê çîroka bibihîzim."
 Di demek kurt de hevalan hemuyan xebera çûna min a bajêr bihîstin. Wan jî doza çûna mektebê ji dê û bavên xwe kirin. Lê doza wan bi cî nehat, Lewra ji zû de qedera wan bi şivantiyê û gavantiyê ve hatibû girêdan. Bi qiriktalî giriyan.
 Ma gelo çi çek di destên zarokan de heye ji xeynî rondikan!
 Demek dirêj neçû, min berê xwe da bajêr û cara yekem ji xuşka xwe ya biçûk û diya xwe bi dûr ketim. U min devji heval û hogirên xwe yên ku bi xemgînî min bi rê kirin, berda.
 Di bajêr de hemû tişt li ber çavên min binuhîtî xuya dikir. Trimbêl, avayî û heya kesên vir ne mîna yên gund bûn. Da ku ez xwe biyanî di nav zarokên vir de nebînim, min ew didan ber hevalên gund, min digot: "Ev mîna Felemez e, evê han wek Husnîko ye û ev bira jî mîna Cenbelîko ye. U ev...?" Zarok wiha li bajêr pir bûn, mîna gêrikan. Ezji hejmar diketim û li ber çavên min zarokên nenas di şûna dostên min de radiwestiyan.
 Di vir de hîn bêtir dilê min bi ser gund û malê ve bû û min bêriya wan dikir.
 Dawiya dawî ew roj hat, ku birê min ê mezin ez birim dibistanê. Erê! Dibistana ku ji bo wê ez li virim. Di sikakên bajêr de me gelek fitil û çiv dan xwe heya em gihîştin avayiyek mezih mîna oda axê. Birê min destê xwe bi alî wê ve kir û got:

-Ev mekteb e.

Hîn em negihîştin, ku derbasî hundirê wê bin, şagirtên dibistanê mîna kulmozê di me derbûn. Erê ez jî wek wan bi

14

berdilka reş bûm. Lê min xwe didît qijakek sipî di nav qijakan de.

Birayê min derbasî ba mudîr bû û piştî demek ne dirêj li min veşariya û got:

-Min navê te nivîsand. U di vê seffê de tê bixwînî -Birê min destê xwe bi alî odakê ve kir- û tê bi van zarokan re bî. Di vir de wî destê xwe bi alî komikek zarok kir û bê deng ez hiştim û derket.

Bi rastî heger ez ne çiyayî bû ma ûji gotinên xelkê netirsiya ma minê bida pey birê xwe.

... . A Lê min bi çiyayîtiya xwe girt, ez mam li ciyê xwe bêdeng. U lêxistina zengil riya veşarê li ber min birî. Bi dengdana zengil deng ji şagirtan biliya û bêpêjniyê perdên xwe avêtin ser hewşê.

Bi dengdana zengilê duduyan hemûyan bi bazdan berê xwe dan devê deriyê seffên xwe û bi rêz rawestiyayî man. Ez jî ketim nav refê xwe. Piştî yeko-yeko em derbasî hundir bûn. Li hundir cara yekem min kursî û masên dibistanê dît.

Di dilê xwe de min got: "U ev jî di oda de tune!"

Di seffê de li cîkî vala rûniştim, bê ku ez ji kesî bipirsim. Ji nişka ve merovek bi kincên efendîtiyê derbasî hundir bû. Gurîna bi şagirtan ket, ji ber rabûn. Bi gurîna wan ez veciniqîm, lê min xwe girt û ez jî mîna wan bi temene sekinîm. Piştî ku vî merovî çend gotinên xwe peyîvî, şagirt rûniştin, ez jî bi wan re... Dûre deng ji seffê biliya. Merovê efendî bi awirên

xwe di nav me de geriya, heya li ser min sekinî. Li min nêrî
û peyivî. Hemûya berê xwe bi alî min de vekirin. Min cî ji
xwe re nedidît, dilê min dihat guvaştin bê ku zanibim ezê çî
bikim. Di vê demê de kurikê teniştî min hilmisek li min da
û bi zimanê me got:

-Çima tu bersîva mamoste nadî?

Bi dengê bilind min lê vegerand:

-Ma efendî çî ji min dixwaze?

15

Şagirtê li teniştî min û pêre yên din jî bi hêl kenyan. (Diyar
bû li ser gotina efendî dikenyan). Efendî awir di wan veda
û hemû man bêdeng. Pişt re şagirtê li teniştî min bû tercuman
di nav min û efendî de. Hat diyarkirin ku mamoste
(dûre piştî demekê min naskir ku ji wan kesan re dibêjin mamoste)
pirsa nav û temenê min û hin pirsên din dikir.

Min li dibistanê çend saet qedand, ku ji min re bûbûn wek
salan. Hîn bêtir min bêriya gund, dê û heval û hogirên xwe
kir. U hîn bêtir rûhê min ji bajêr û xelkên wê çû. Ez bi dilşikestî
vegeriyam malê û min naskir ku bavê min cara yekem
ez xapandim. Ez ku gihîştim negihîştim malê, min berê xwe
da bavê xwe (hîn ew li bajêr bû) û min jê pirsî:

-Kanî stranvan û çîrokvanên te? U çima ne bi zimanên me
dipeyivin?

Bavê min dît ku bi van gotinên han min nigên xwe zêdeyî
xwe avêtin, lê tevî wilo ew ji iyarê xwe derneket, bi rûyê min
de ne pijiqî. Berovajî, bi dengê dilovanî, ne wek ê hercarî yê
di van hala de bi min re peyivî:

-Kurê min hîn ti biçûk î... Demek dirêj wê nere tê hemû

tiştî nasbikî. U çîrokajî wêji we re bêjin. Lê li ser ziman; divê ti nasbikî ku zimanê me yê malê ye, û ew zimanê din ê mektebê ye -bavê min destê xwe danî ser milê min û berdewam kirkurê min bahweriya mi bi te tê. Maşellah ti bi hiş î û di demek ne dirêj de tê wek bilbil bi zimanê hukûmetê bipeyvî.

Min ji bavê xwe ne pirsî, çima zimanê me yê malê ye û çima yê din yê mektebê ye. Lewra di mala me de gotinên mezinan nedibûn didu û her û her wê bi ya wan bûna.

Roj û meh buhurîn lê her û her dibistan nebû mîna odê ji xeynî dersa însa (1). Çimkî ew dersa han ji dûranî çîrok û çîvanok tanî bîra min. U bi rastî jî vê dersê ji yê din bêtir ez dêşandim. Ne tenê wilo, heya ruhê min ji dibistanê dibir.

Di vê dersê de her şagirtêkî diva bû li ser serpihatiyek xwe

16

bipeyiviya yanjî çîrokekji çîrokên ku bihîstibû bigota. Dema dor digihîşt min, min dixwest çîroka li ber dilê min şîrîntir kîjane wê bêjim, lê min nikarîbû; lewra devê min diket hev û sermiyanê min ji gotinên zimanê nuh hindik bûn nikarîbû alîkariya min bike ji bo kû ya dilê xwe bêjim. Di şûna ku mamoste alîkariyê bi min re bike, digot:

-E li dû wî.

Ax, xwezî wî zanîbûya ez çiqasî bi vê peyvê diêşiyam!! Û erê gelek sal bihurîn di jiyana min de lê her û her ew gotina han man kulên giran di dilê min de. U çiqasî ji bo vê gotinê di xew de qarîn bi min diket, diya min ez ji xew radikirim û digot:

-Kurê min te xêr e, çima ti di xewê de dikî qerebalix! ! Hebe tine be kabûs li ser dilê te rûniştibû, çima te dikir qarîn?

Helbet min a rastî ji diya xwe re ne digot û a rast ew bû, diya min ez ji xew radikirim, gava mamosta digot "E li dû wî."

Carna jî diya min ez ji xew radikirim û dipirsî:

-Te xêr bû kurê mi, ti di xewa xwe de dikeniyayî?

Diyar bû ku dema mamosta bi zimanê me dipeyivî û dipirsî ez dikeniyam.

-Kî wê çîrokekê ji me re bêje?

Min tiliya xwe bilind dikir û digot:

-Ezê... Ezê...

Mamoste rê dida min û ez bi şarezayî dipeyivîm. Piştî temambûna çîrokê mamoste digot: "Bravo!" berê xwe dida şagirtan "Jê re li çepika xin!"

Belê, roj û meh çûn, dû re salan jî dan dû wan... Gelek tişt di jiyana min de hatin guhartin, tenê xwezîtiya nivîskariyê bi min re ma.

Erê, sal çûn û ez jî bûm mamostê seffa yekem li gundekî.

Ev dursa yekem e. Şagirt ji ber min rabûn û bi temene man rawestiyayî.

17

Mina hemû mamostayên cîhanê min xwe bi wan da naskirin, yeko yeko, navên wan jî pirsî û di defterê da nivîsand. Dema dor gihîşt yekî ji wan, ew ma bêdeng û bersiva pirsê min a li ser navê wî neda. Min lê nêrî û pirsê xwe ducar kir.

-Navê te?

Ma bêdeng û serê xwe xist ber xwe, ez bi ber wî de çûm.

Lewra baweriya min hat ku ji min fam nake. Ji bo wilo min bi zimanê Kurdî -bibuhurin bi zimanê malê- jê pirsî:

-Navê te çiye?

Şagirt serê xwe rakir. Çavên wî mişt hêsir bûn, bi dev li ken
û lêv ricifî got:

-Na...vê mi... Xoşnave...

Tevizînok bi laşê min ketin û mi xwe dît di Xoşnav de... Ma
gelo ewê xwe di hinekên din de bibîne?!

18

WE KENGI BE

Xwe avêt nigên wê, borînî pêket û got:

-Yadê! Wa yadê bi qurbanê, tê mi efû bike. Çimkî mi gelek
serêşî ji te re çêkir û mi dilê te hişt û êşand.

Dê runişt, ku wî rake ji ber nigên xwe. Ew hembêz kir û bi
dilovanî maçî kir. Di nav girî de û di ber xwe de jê re got:

-Lawê mi dawî va ti hatî û me hev dît. Mi digot qey nema
em hev dibînin...

Pişt re Siyamendji xew rabû û kir nekir nema çavên wî çûn
ser hev. Lewra dûrbûna ji welat û ew xewna, ku nuha dît kul
û derdên wî rakirin. Berî hemû tiştî ew bîstka ku xatir ji dê û
19

bavê xwe xwest. Wê çaxê dê jê pirsî:

-Rastî tê herî û heya şeş salan, em nema hev dibînin?

Berê Siyamend li ser çûna Ewropa yaji bo xwendinê bi diya
xwe re peyivîbû. Tevî ku dilê wê dixist cî û jê re digot, hersal
emê hevdû bibînin. Lê her û her gotina "erê" nedixist
destê wê. Dema roja çûnê hat, jê re got ezê herim ba hevlekî
xwe. Siyamend ev derewa han kir, lewra diya wî gelekî nexweş
bû. Daku nexweşî girantir nebe, gotina rast, ya tal jê re
negot. Ji wê rojê de dûrî hev ketin û ta rqa îro hîn negihîştine
hev.

Dema Siyamend xatir ji bavê xwe xwest, bav jê re got:

-Kurê min, ez xweş zanim ku em nema hev dibînin.

Siyamend di ber dilê bavê xwe da û devliken ji re got:

-Bereka Xwedê li te be yabo. Mal avao, tê hîna sed salî bikî
û tê ji dîtina min aciz bibî.

Bav bişirî, weke kesê ku bêje "Ez ne zarokim û ez zanim çî
dibêjim..."

* * *

Piştî sê salan ji çûna xwe, Siyamend peyvên han di namakê
deji dostekî xwend: "Bera tû saxbî, zilambî... Bavê te çû rehmêtê
di roja..."

Wê çaxê tîp û ûşeyên namê bi rewrewekî li ber çavên wî
çûn û hatin.

Siyamend mîna dîna di sikakên bajêr ên mişt xelk, geh dimeşiya
geh bazdida û geh jî di sikakên teng û vala de derbasdibû.

Bi vî awayî xwe dît-nedît ku li ber unîversîtê ye. Wê çaxê,
berê xwe da fakultiya xwe û bi hêrs pê re peyivî:

-Ji bo te min dev ji meriv û welatê xwe berda û bavê min
jî mir, min ew nedît. Bela lanet bê li wê seeta ku min biryar
stend bi berdewama xwendinê!

Bê ku li ser dîna wî be, dengê ji dûrve hat:

-Ma gelo te nebihîstiyê ev meteloka han: "Doza xwendinê
20

bike heger li Çîn ê be!"

Siyamend li dengê ku li ber guhê wî ket vegerand:

-Doza xwendinê ji kê re? ji bo çî?

Ji nûv re deng lê vegerand:

-Sed mixabui, hîn tu nizanî te çima ev qonax qetandine.

Siyamend guhên xwe miç kir û bi dengekî hîn bilindtir vegerand:

-Loma tu nizanî di vê riyê de tiştê ku ez distînim naghê nivê ku ez winda dikim?

Deng jî serttir lê vegerand:

-Tu çî bê mejiyî. Tevî ku te xwendina xwe di nav herdu dîwarên min de xwendiyê. Kêji te re gotiyê jiyana bi rehetî dikeve destê meriv! Ma gelo tu nizanî rîya wê bi stirî û tirs e? Di be ku tu qels bûyî û nema di xwe re dibînî di rîya xwe de berdewam bikî.

Siyamend bi wan gotinan êşiya û li ber xwe ket, lê her û her bi tona berê lê vegerand:

-Çima gelo ezê xwe bidim kuştin û xeynî min di jiyana de bigîhên doza xwe bi rehetî û xweşî. Lewra ez jî...

Deng gotin ji devê wî girt:

-Anha.. erê anha min naskir tu çî dixwazî. Tu li navê xwe digerî. Lê tuji bîr dikî, ku tu ne weke wan kesên ku armancên xwe durrî bêvilên xwe nabînin, çimkî milletekî bindest û stuxwar li benda te ye. Ma tu nizanî ku tu ji bo wan hatiyî, qey te ji bîr kiriye?!

-Tê bîra min û min ji bîr nekiriye, lê ez westiyam. Erê ez westiyam û dixwazim weke kesên din bijîm. Mîna keroşk û mişkan. Tenê ku ez bimînim li dinê.

Deng lê vegerand:

-Gelo nayê bîra te gotina yekî ji hozanan: "Jiyana şêrîne lê jê xweştir û xweşiktir xebata ji bo wê ye."

Bi hêrs Siyamend lê vegerand:

21

-Bese, min têr gotin xwar, ka bavê min. Ez diya xwe dixwazim,

ez bavê xwe dixwazim. Ez dixwazim bi rehetî bijîm û ne zêdetir...

Bê pêjnyê konê xwe berda erdê. Siyamend guhê xwe miç kir ku ji nû ve deng bibîhîze, lê bê fêde bû.

Nayê bîra Siyamend kengî gihast malê. Lê tê bîrê ku li ber unîversîtê li ser kaboka runiştî bû û banê dikir:

-Bibhur, min efû bike, min xwe winda kiribû û hişê xwe berdabû.

Her û her Siyamend nizane ku diya wî li ser ruyê dinyê ye yan na, lê zanî bû ku dema yek ji cem tê, diya wî diçe ba wî jê dipirse: "Çima ew jî nayê, kurê min, dilovanê min, ez li bendî me."

Siyamend pir ditirse ku nema wê bibîne, mîna ku bavê xwe nedît berî mirinê. Di nava xwe de diqijqije û dişewite li ser vê dûrbûna wan aji hev. Welat û dê wîna dikişkişînin bi alî xwe de, lê sedemek heye ku Siyamend nikare li wan vegere.

22

XANIYE VALA

Erê Taxa Herbiya taxekji taxên bajêr bû, lê bi rastî gundek di nav de bû. Ne wiha navê gund li taxê bibû. Lewra kesên tê de dijîn hemû dan û stendinên gundayetî bi xwe re anîbûn.

Em zarok, heger li gund êvaran li ser benderan me dilîst, li vir, li bajêr, li başûrê malan, li dora bexçan, herwekî mîna li gund me dilîst. Dema havînî, dijwarî ne diketin ber me.

Me heyra nivê şevê li ber tava heyvê.şevbêrkên xwe bi lîskên; "Çirê", "Yadê Xezalê" û yan jî bi dizîtiya ji bexçe û werzan derbas dikirin. Dema cîba axê gundê biniya bajêr ji meyxane û çayxanan vedigeriya, emjî dihatin malên xwe. Çima di vê

demê de em vedigeriyan? Ne dûre me bi riya wî nasdikir, ku şev ketiye nîvê xwe yê duduya û diva bû em razên. U ne dûr bû ku em li bendî axê diman ku em heciyatên nivtazî li teniştaya wî bibîn. Dibe ku herdu sedem bi hev re em dihiştin heya derengîya şevê. Piştî ku em di toza cîba axê diman şevbêrka me bela wela dibû.

Dawiya payîzê, zivistanê û pêşya buharê em diman bê war. Çimkî malek ji yên me tune bû, ku me bihewîne, bi vî awayî em li ber qorzîkên malan diman, da em çîrokari ji hev re bêjin û şevbêrkên xwe bikin. Lê baran û sermê ne dihişt em tamekê ji çîrokên xwe bikin. Heger ne Heciyê Qurdîsî bûya, emê mabûna li ber dîwaran.

Piştî ku Hecî bexçê xwe berda û cenanê wî barkir, xanyê cenantiyê ma vala. Kurê Hecî yê biçûk; ewjî hevalê me bû û bi me re dilîst. Ji bo vê yekê dilê wî bi me şewitî û kilîta xanî da me. Xwezî we zanîbûna çiqasî em şabûn bi vî xanî! Bi girtin û vekirina çavan hundur hate xemilandin. Her yekîji me tiştê ji malê anî, yan jî dizî. En ku merş anîn, ên ku belgeh anîn... Bi kurtî hundirê me bû wek malên bi xwedî û bi xêr û bêr.

Zivistana me bi xweşî derbas bû. Pişt re mîna her car buhar, dû re havîn bi serme de hat. Dîsa bi şev li ber tava heyvê me lîstikên zarotî dilistîn. Bi roj jî di qice-qica rîjê de em di xaniyê xwe de rudiniştin. Lê kêfû xweşiya me berdewam nekir. Lewra rojekê ji rojan em hatin "mala xwe" me dît pîrekêke bi du zarokên xwe lê daniye. Pişt re me naskir, ku Heciyê Qurdîsî xanî jê re vekiriye û dayê.

Ew mal ji ku û çima hatiye, kesî ji me nizanî bû. Tenê me bihîst ku mêrê pîrekê hatiye kuştin. Lê çima û ji bo çi? Dîsa me nizanî bû.

Di destpêkê de bi her awayî me dijminantiya vê malê kir. Geh me li kurê mezin ê di temenê me de bû dixist, geh me ke-
24

vir davêtin hundur bêyî ku em zanibin wê li çi û kê keve. Lê rojekê, girîyê dê û kurê biçûk ê bi navê Lawiko em ji hovîtiyê derxistin. Lewra kurik ji birçî bûna û dê jî ji bêçariyê digiriyan.

Me ev yek ji gotinê dê ku ji kurê mezin re digot, naskir:

-Here parsê, belkî ti nanekî ji me re bidî hev. Ma tu nabînî wê birê te ji birçîna bimre. Ma ne qaşo tu mezinê malê yî. Berces mezinê malê heşt-neh salî bû. Bi gotinên diya xwe serê xwe bera ber xwe da û bêdeng ma.

Me hemiya li hev nêrî bê ku em bipeyivin, me berê xwe da malên xwe. Piştî demek ne dirêj her kesî tiştê ji wan re anî. Berces ji fediya hîn bêtir serê xwe xûzkir. Dê çav bi hêsir xwarin girt. U ji me re dua kir. Kurkê biçûk giriyê xwe birî û bi gepa hate nan û xurman. Uji wê rqjê de me nema li Berces xist. Em bûn dostên vê mala biçûk, hejar û bêkes.

Dê di nav malan de kar dikir û Berces li ber birê xwe yê biçûk dima. Ne tenê ew, lê me jî alîkarî pê re dikir. Dûre, me naskir ku gelek caran, ji tirsê me re dê nikari bû zarokên xwe li malê bihiştin û malên ku kar tê de dikir ne dihiştin bi zarokên xwe bihata. Bi hogiriya me ji vê malê re, ew û em ketin jiyaneke nû. Bi rqj di kela germê de, me xwe davêtin hundirê xanî wek berê. Evarajî me li dora wî dilîst. Bi vî awayî havîn kete dawiya xwe. Heya vê demê dê û zarokên wê, hinekî bi ser

xwe ve hatin. Hem ji karê dê, hem ji alîkariya me, û hem ji zekat û fitran.

Rojekê beyanî mîna her car her yekîji me tiştêkji xwarinê di dest de em hatin xanî. Li devê derî Berces em vegerandin:
-Birê min bi sorika ketiye, diya min dibêje, heger kesên bi sorika ne ketine, bira derbas nebin.

Erê di van çend rojên dawî de, me didît ku Lawiko sisto fisto ye, lê hîç me bîra nexweşiyê nedibir. Gelekan ji me, ji gotinên dê û bavên xwe zanî bû ku bi sorikan ketine lê hin kesên me jî nizanîbûn. Lê tevî wiha, kes ji me venegeriya.

25

Di hundir de, di quncikekê de Lawiko di nav ciya de bû;
Dê heya qirkê ew nexumandibû, tevî ku dem havîn bû jî. Demek dirêj em li ser rawestiyan bê ku dê û em bi hevra bipeyivin.
Lawiko jî xar bû. Ji nişkave bû pist-pist di nav me de û em derketin.

Çaxê êvarî em hatin û herkesî ji me tamtîtek ji bo Lawiko bi xwe re anî bû. Vê carê dê ciyê kurkê xwe yê biçûk derxisti bû ji derve, ser erzêlê. Dema me diyariyên xwe da destê dê, wê jî ban Lawiko kir, destê xwe li ser porê wî bir û anî û jê re got:

-Binêr lawo, hevalên te çî ji te re anîne!

Bi sistayî Lawiko çavên xwe vekir û awirên xwe li tamtîtkên ku me jê re kirîbûn gerand. Lê em man mat mayî dema me kêf xweşî di çavên wî de ne xwendin. Lawiko çavên xwe girtin û dîsa xar bû.

Em man behetî, çimkî bi bûzakê, yan bi teyîbûneyê berê rjê deh caran me ew dişand avê û nan. Lê niha ev tiştên han,

li ber destê wî bûn ne doz fikir ne destê xwe davêtiyê.
Dê li ber serî, her bistikekê paçik di zerka avê de şil fikir û datanî ser eniyê. Deng ji dê biliya bû, geh keser vedida, geh hêsir bêdeng dibarand û geh jî xwe davêt ocaxên ewliyan. Wê êvarê me listîkên xwe nekirin. U em man li ber destê dê. Dema şev zîz bû, bi tenê reyandina segan, didan nasîn hatin û çûna rêwiyan. Lawiko yek car bê hal bû. Yekîji me bi dizîka ji kurê melê re got:

-Here dû bavê xwe, ji bo ku bê yasîne li ser bixwîne.

-Ne hewce ye, zarok teyrikê bihiştêne. -Kurê mele bi zanatî bersî da- U em dîsa man bêdeng. Lê bêdengiya me berdewam nekir. Lewra qêrînek bi dê ket. Bi qêrîna wê me naskir, ku lawiko ruh da. Dê ne tenê digiriya, dilê wêji nava wê derdiket. Por bi xwe nehişt. Berces xwe bi girî di erdê dida, û em jî pêre. Di vê demê de cîba axê derbas bû, em di nav tirabêlkê

26

de man. Lê kes ji me ranebû û venegerya malê.

Piştî çend rojan ev mala ku bi du kesan ma ji nişkave çilo hatibû, wihajî winda bû. Me zarokan xweş zanî bû ku ev mal nema vedigere, tevî wiha jî em hîç nema hatin "Xaniyê Vala"

27

RÛREŞ

Hemo, qutiyek tûtînê, çeqmaqê bi fitîl û kurkek nuh da destê kurê xwe Beko yê çarde salî û jê re got:

-Tu zanî ji bo çi min ev tiştên han ji te re kirîn?

Devê Beko ma ji hev, bê ku bawer bike ji çav û guhên xwe û di dilê xwe de got: "Heye tune ye wê tiştêk bi bavê min hatibe.

U dibe ku di navbêna min û birê min de şaşbûye. Ma gelo ne wî berî çend rojekî hezar gotin ji min re kir, dema çixare di destê min de dît. Ne tenê wilo, bi ser de min li malê çend şirmaq jî xwarin. Na, na tiştêk pê hatiye?"

Hemo rê li ber mujûlbûna kurê xwe birî dema jê pirsî:

28

-Rastî, ti nizanî ji bo çi min ev tişt kirîn?

-Na, yabo, ma ezê ji ku zanibim. -Beko bersîv da û hîn jî bi çavekî ne bawerî li bavê xwe temaşe kir.

Bav ne xwest lîstika pisîk û mişka bi law re bidomîne, jê re got:

-Kurê min Beko, ti bûyî zilam û ev xelatên han ji bona xwestina qîza Hecî Elî ji te re.

Ev xebera han ne kêrî xelatan, Beko bê hêş û gêj kir. Ji bo weha bêhemdî peyv vegerand:

-Xwestina qîza Hecî Elî ji min re?

-Erê kurê min, zilamê heqîqî ewe, yê ku di imrê te de jina tîne.

Şeva daweta Sîno, dilê Beko cara yekem bi hawakî din lêxist û dixwest ku bavê wî yekê mîna ya hevalê wî ra baniya.

Lê tevî vî tiştî şermê rê ne dida ber. Lê ne tenê şermê, Beko digot: "Kesên jinan ji bavên xwe dixwazin bê fedî ne." U wî jî xwe re digot: "Heger ez bimrim jî tu carî ji bavê xwe jina naxwazim!" Lê niha dema bavê wî li ser xwestinê jê re peyîvî ku wê di demek nêzîk bibe bi jin, dilê wî bi tirs û kêf lêxist, bê hemdî xwe bişirî.

Hemo ev tişt dît û bi hêrs jê pirsî:

-Ma ti pirsî navê dergistiya xwe nakî?

Di vir de dîsa xewn û rastî di dilê Beko de tevlî hevbûn û xwe dît gunehkar bê ku gunehên wî hebin, ji bo wiha bi fedî û giranî bersiva bavê da:

-Ez nizanim.

-Kurê min navê wê Sultanê ye, û ewjî li gora navê xwe ye

-bav wiha got, destê xwe bi dilovanî li milê Beko xist û gotina xwe berdewam kir:- Lê divê ji niha û pêve ti xwe ji bîr nekî, ku ti bi dergistiyî û ji bo wihajî divê ti nema bi heval û hogirên barote re bigerî. Çimkî wê ne laîq bê lîsk bi wan re.

Di virde bav dej kur berda û Beko di ciyê xwe de ma heyirî.

29

Zû bi zû xwestina keçekê ji Beko re, di nav hevalên wî de bela bû. Wanjî berê xwe danê, dakû wî pîroz bikin, ji alîkî, û ji alîkî din qala xwestin û guhestina keçikan bikin. Lê Beko, gotinên bav bi cî anî, guh neda wan û bi wan re derneket derveyî gund.

Destpêkê heval û hogirên wî nasnekirin sedemê xwe danaliya Beko ji wan, lê têgiştin, gava diya wî bera wan da û got:

-Hûn ne yên ku Beko bi we re bilîze. ! Beko bûye zava û mezin bûye.

Bi rastî jî Beko bi qudreta Xwedê bû ji mezinan û wanjî di nav civatên xwe de ew hewandin. Ji bo wilo dilê hevalên wî tije qehir dibûn û bi çavnebarî lê dinêrîn. Lê Beko xwe paye dikir ne tenê bi rûniştina bi mezinan re û bi çeçmaq û qutiya xwe jî. Ji bo wiha Beko bi minasebet û bê minasebet qutiya xwe dida yên dora xwe û ji xwe re jî çixarek dipêça.

Beko mehekê bi şanzî derbas kir. Lê pişt re acizî kete canê wî. U ev lîska nuh a bi mezina re li cem bû bêmane. Di ser re *

jî, Beko dît ku xelkê mesela dergîstiya wîji bîrkiriye û kes nema qala wî dike. Di dilê Beko da hat vejandin zarokîtiya wî û dîsa wek berê kete nav rêzên wan.

Bav dîna xwe da kurê xwe û dît çî pêre çêdibe. Ji bo wilo rojekê ji rojan ban wî kir û jê re got:

-Beko kurê min diva bû, ti ji zûda çûba mala dergista xwe, lê ne xem e niha jî ti karî herî.

Beko bi gotina çûnê veciniqî û ma heyîrî çî bêje. Bê hemdî peyva zaroktî ji devê wî derket:

-Bi tena xwe?

-Maşallah! Ma tu biçûkî! Helbet bi tena xwe.

Heya vir gotin hat birîn. Beko xweş naskir ku peyv li ser neçûnê bi bav re bê fêde ye, ji bo wiha (tevî ku dinya payîz bû, da ku xwe pê mezin bike) kurkê xwe li xwe kir, destê xwe di ser berîkên xwe re bir, ji bo ku nasbike ku qutî û çeqmaq di 30

ciyên xwe dene.

Beko dûre yek nekir didû xwe avêt ser hespê û berê xwe da xezure xwe.

Mala dergistiyê bi kefxweşî pêrgî wî hatin. Beko bi xezûrê xwe re li oda mêvanan rûnişt. Çavên wî çarçav dibûn û bi awirên xwe li dergistiyê digeriya. U dema "apê" wî jê pirsî:

-Te xêre kurê min?

Bi zaroktî lê vegerand û gotina bavê xwe got:

-Ez hatime dergistiya xwe bibînim.

Hecî Elî li ser vê gotinê di ber xwe de bişirî û hemdê xwe kir, ku ew bi tena xwe ne. Hecî Elî naskir ku ya baş ewe, ku bi mehnakê qîzê bîne aliyê zilaman, hîn ku kes ne hatiye ba

wan. Hecî Elî rabû ser xwe û berê xwe da aliyê malê. Devê Bekoji kêfa maji hev, dema dengê "hezûrê" wî hatiyê: "Sultanê, keça min şebeş bibe hundir û ji mêvanê me re bişkîne."

Hecî Elî vegeriya û pêre qîza wî. Da ku Beko zilamîtiya xwe pêş dergistiyê bike qutî û çeqmaq ji berîka xwe derxist, hem ji kêfa hemjî ji fediya, bi destekî recifî dest bi pêçana çixarekê kir. U hîn bêtir herbilî û lebikî gava çavên wan bi hev ketin. Rûçikên Sultanê bi awirên wî re bi sorgulî reng da, mijankên xwe yên dirêj berda ser çavên mezin û reşbelek. Beko pêçandina xwe berdewamkir û Sultanê dest bi telaşkirina şebeş kir. Sultanê şebeş tîfil-tîfil dikir û dixwest xwe jê re şareza bide xuyakirin. Beko jî dixwest bi qalûnvexwirî bi zilamtîjê re bide nasîn. Sultanê da xwe ku mesefê deyne ber. Beko jî destê xwe li çerxa çeqmaq xist da ku fitîl pêkeve. Lê çirûskji kevirê çeqmaq neçû. Beko du carî-sêcarî kir lê her û her bê fêde bû. Ji fediya û qehra reşxeniqî dev li lêva xwe yajêr kir û ta Xwedê hêz dayê dawiya kefa xwe li çerxê xist. Di virde ji bê bextiya re Beko ba ji ber çû.

Sultanê xwe negirt, mesef avêt bi ken û bazdan berê xwe da aliyê malê. Hecî Elî di xwe de dernexist mîna ku tiştê ne-

31

bihîstiyê. Beko bîstekê ma hişk li ciyê xwe û dû re wek golika ku mozqirtik bi pey keve bi bazdan ji hundir derket. Beko bazdida, ti di bê qey bi rastî mozan daye dû. Ew sekinî, tenê dema gund texnekî ma li paş wî. Berî ku rûnê awirên xwe li dora xwe gerand kela girî ket qirkê û hêsrên xwe bê şerm û fedî barandin.

Beko digiriya li ser vê rûreşiya xwe. Di hundurê xwe de nehaskirina

wî bi xurtî ji hemû merovan re çêbû. Tevî ku Beko nedixwest ji nuv re çavê wî li yê mala Hecî Elî kevin, lê diva bû vegeriya, lewra hesp û kurkê xwe li şûna xwe hişti bû. Destpêkê di nava xwe de da û stend berî ku biryara vegeerê bistîne. Lê dema da xwe ku vegere bi qehr tufî erdê kir û bi gayên tembelî berê xwe da gund.

Bi her avêtinek gavekê, Beko bi xwe dihesiya ku ben li qirkê tê zivirandin. Bi vî hawayî bi bask şikestî gihîşt gund. Ji tirsê ku çavên wî li yê xelkê kevin. Beko serê xwe ranedikir, lewra ji wî werê hemû kes li gund bi hev re li ser rûreşiya wî dipeyîvin. U ew ma hişk li ciyê xwe, dema "hezûrê" wî banê kir:

-Derbas be kurê min. Ne hewcî revê bû. Ma gelo ev tişt bi kê re çênabe?

Beko bi dengekî melûl got:

-Destûra min bide ez herim malê.

Bê ku Hecî Elî lê vegeerîne, Beko derbasî hundur bû, rahişt kurk, li hewşê xwe avêt ser hespê û mîna gula ji devê tivengê derkeve ji hewşê derket.

Bidûdedengê "apê" wîhatiyê: "Tijîbîrnekî, silavênmin li bavê xwe ke û em li bendî hatina tene.

Beko di nava xwe de got: "Lanet li te û bavê min bê û pirika ku ez bi we re ketimê!"

Dema gund li ber çavan wînda bû Beko hesp sekinand li herdu aliyê rê nerî û çend caran li paş xwe jî zivirî. Her tişt li dorê bê deng bû. Bi xemgînî Beko axînek kişand, hêdîka
32

paniya xwe li zikê hespê da, mîna ku hesp mebesta xwediyê xwe nas bike, ewjî hêdî-hêdî meşiya. Lê Beko her û her mijûlî

ser rûreşiya xwe dibû. Ne tenê mijûl dibû, li rêkêjê digeriya da ji werta xwe xelasbe. Carna bi dengekî bilind û carna di nava xwe de, bi xwe re dipeyîvî: "Ez nema wê tînim -wiha ezê ji bavê xwe re bêjim- piştî vê rûreşiya han ezê çilo karibim wê bînim; Howeh li vê ecêbê! Tiştê hat serê min! ! U hîn di ser hala re Hecî Elî henekê xwe bi min dikir; "ev tişt bi hemû kesî re çêdibe... Xem nake". "Erê yabo çima na? Rûreşî ne rûreşiya te ye. . . De xwezî ti ba, wê çax min bigota xem nake. . . Xwedêwo recak min ji te heye ku mala Hecî Elî ji kesî re nebêje!!

Lê Xwedê neke, hat ku ez têkevim devê xelkê...

Hew cî ji mi re namîne û tebata min nema dibe."

Di virde hat bîra Beko çilo bi zilamekî re wiha çê bû mîna bi wî re. Ew kes bi dinyayê terqî û piştî pazde salan ji vegera xwe dît ku rûreşiya wî bûye çîrok. Xelkê ji hev re digotin:

"Kurê me sala rûreşiya filan kes çê bûye, yan jî filan kes mir wê salê." Dilê Beko pê şewitî û bi halê xwe giriya. Bi van ramanên han ên giran û nexweş Beko ghişt gundê xwe.

Li malê Hemo tenê bû. Dema kurê wî devê derî derbaskir û çavê wî lê ket ji zû hatina wî ma ecêpmayî ji bo vê yekê jê pirsî:

-Xwedê bi xer bike çima tu wiha zû hatî?

Beko bêmad got:

-Ez naxwazim jinê bînim, loma ez hatim.

Bav bi vê gotinê ma behetî û got:

-Çilo ti naxwazî? (Bav xwest bêje min gotin daye Hecî Elî ne te, lê gotinên xwe negot û bi hawakî din peyîvî.) U xebera guhestina me di nav xelkê bela bûye. Ev ne laîqê me û mala Hecî Elî ye.

Beko cevilî dema bavê wî got "xeber", lê pê re bihna wî hat ber, gava peyv ne li ser serpêhatiya wî bû. Tu rê li ber Beko

33

nema xeynî bêje:

-Min Sultanê ne eciband.

-Çilo te ne eciband? Ew ji hemû qîzên gund xweşiktire!

Û...

Beko gotina bav di dev de birî û got:

-Dibe lê ez qurbana te me yabo nehêle... Girî kete qirka

Beko û bê ku bipeyîve xwe avêt singa bavê xwe û borînê pê ket.

Bav behetî û ma heyîrî çî bêje. Tu tişt li ber nema xeynî kurê xwe haj bike. Ji bo wilo destê xwe li ser porê wî bir û ne wek adeta xwe bi dengekî nizm jê pirsî:

-Ti ji bavê xwe re nabêjî çî qewimiye, ji mi re bêje, ezê her tiştî helbikim.

Beko da xwe ku bêje, lê devê wî negeriya, ji bo vê yekê bi rengê din peyivî:

-Musîbet bi serê min de hat û rûyê min reşbû.

Bi gotina, "musîbetê" û "rûreşiyê" Hemo bi mijulên xwe dûr çû bêdebarî pirsî:

-Çi musîbet? Çi rûreşî? Kesî girê xwe di te da, yan kesî ew revandiye..?

-Ne.. Lo yabo..

-Çi yabo... Bêje û dilê min rehet bike.

Beko bi şerm peyivî li ser rûreşiya xwe. Bavo lê vegerand:

-Lanet li te be, te ez tirsandim! Ma hewceye ti biqeliqî li ser vî tiştê vala. . . Dema hûn hev bibînin muheremat di nav we de

namîne.

Helbet Hemo di nava xwe de aciz bû ji vê xeberê, lê nexwest barê kurê xwe girantir bike jê re got:

-Bihna xwe berde niha, her tişt bi bihna firehê çêdibe.

Mehek di ser vê gotinê re derbas nebû, bûk guhestin, tevî ku Beko nedixwest. Beko sond xwar û got di nava xwe de: "Heger Sultanê qala vî tiştî bike ezê wê berdim."

34

Piştî ku berbûk bela bûn, Hemo kurê xwe bir oda bukê. Li devê derî di guhê wî de wişwişand: "Bi zilam be û xwe neke ehmeq!" Derî li pey girt û vegeriya.

Dema Beko derbasî oda bûkê bû, awirên wan li hev ketin.

Zava bê hemd ma hişk li ciyê xwe... Lê kenekî wiha bûkê girt, bê ku karibe xwe bigre, kire tîqe tîq. Her Beko çavê xwe lê dizêwirand, wê hîn bêtir kenê xwe berdewam dikir. Beko xwest bi rûyê wê de bipizîqe û telaqê wê têxe dest, lê devê wî negeriya. U mîna kûçikê ji ber dengê tivingê bireve, Beko bi lez û bez ji hundir derket.

Di hewşê de li bin guhê bavê ket. Hemo ew sekinand û bi daf da pêşiya xwe. Li ber deriyê bûkê bi guhê kurê xwe girt û bi hêrsjê re got: "Lawê kûçikji bedêla hinerê xwe pêşî kiye, ti ji ber wê direvî!?"

Sultanê heftekî ma li cem mala zavê, lê Beko her û her nîkarîbû hinerê xwe pêş wê ke. Ji bo wilo bûk çû mala bavê xwe û nema vegeriya.

35

HESIR U BARAN

Qermîçokên salan di ruyê pîrê de bûbûn xaçîrêkên herikandina

hêsiran. Pîrê di sikakên bajêr de dimeşiya, tevî ku baran dihat ji erd û esmanan. Bi vî awayî hêsirên pîrê û peşkên baranê tevî hev dibûn, xweşik ne dihat naskirin, ku şilbûna mijankên çavên pîrê ji girî, yan ji baranê ye. Pîrê diçû bê ku dîna xwe bide kesên pêrgî hatî. Tenê yek gotin, yek pirs li ser zimanê wê bû: "Kê kurê min Mehemedo dîtiye?" "Kîjan kurê şîrhelal kare ciyê wî pêş mi ke?"

Pîrê berî sê rojan li qelaç û newalên dora bajêr digeriya û her jî ev peyv û pirsên han li ser zimanê wê bûn. Tenê car car-36

na di ber xwe de bi şewat digiriya. Ne dûr e ku pîrê pirsê kurê xweji devî û zinaran kiribû, ne dûr e jî ku bi wan re mîna ku bi kurê xwe re bipeyîve, dipeyîvî. U ne dûre tanî bîra xwe çilo kurê xwe ji destê xwe berda.

Pîra Helîmê ji kure-pista cîrana naskir ku kurê wê çû ye nav pêşmergan. Pîrê destpêkê bawer nekir, çimkî kurê wê tu car derew lê nekiribû. Lê dema çûna wî dirêj kir, dilê wê şetî.

Lê dema ku hevalekîji hevalên wî hat ba wê û pere da dest bi vê gotinê re:

-Mehemed li bajêr karekî baş dîtiye û ev pere ji te re şandin.

Wê çaxê dilê pîrê kete cî, ku bi rastî kurê wê çûye bajêr ji bo kar. Heya sal zivirî, pîrê meh bi meh pere digirtin.

Bi vî awayî pîrê rojên xwe dibuhirand, heger bi xemgînî bû, heger bi qirik talî bû. Lê ne bê hêvî bû. Heya rojekê, lê ne xwezî bi wê rojê.

Çend pîrekên gund li ser kurê wê dipeyîvîn bê ku haya wan

ji pîrê hebe:

-Pîra pepûk her meh pera distîne, lê nizane ku heqê xwîna kurê wê ye!.

Bi vê gotinê pîrê hat xwar û ji ser hişê xwe çû.

Dû re kesên gund bi hezar Qur'ana û tirbên ewliya jê re sînd dixwarin ku gotinên pîrekan ji çav nebarbûyê ye û ji pite-pita wan e. Lê her û her pîrêji wan bawer nekir û kuştina lawê wê di mejiyê wê de meya.

Gelekan ji kesên bajêr çîroka pîrê zanî bûn û pirên wan di pîrê de dinasîn dîn bûn û xurufandin, lê ne nişvê yekem û ne yê dudan bi destê pîrê negirtin.

37

WINDAYO

Birîn di laşê cwan de çiqas kur û fireh be, heger ne ya mirinê be, wê bighê hev, lê tevî wiha jî birîn şûna xwe di laş de dihêle.

Di xwîstê de; nabêna du kaşan newalek e tevî ku demekê herdû ciya yekbûn jî. Lê nema digên hev. Wiha ji ku dar bê birîn, nema şîndibe. Lê dema dar tevî rehên xwe tê rakirin û li cîkî din tê çandin, wêjîyana xwe berdewam bike, di destpêkê de pelên wê zerdibin û carna jî diweşin. Lê hindik-hindik rehên xwe bera zikê erdê dide. Di vir de şertek heye, divê ev dar bê çandin di axek mîna xwelîya xwe de, yan jî nêzîkayî lê

38

bike. Heger ne wiha be, bêguman, wê dar biçilmise û hêdîhêdî bi alî hişkbûnê, mirinê ve here.

Ev tiştên han li ser şînkayên xwîstê tên gotin. Lê ku hat û insan ji refê xwe ma? Gelo wê karibe jîyana xwe mîna berê

berdewam bike? Bi xwe em zanin dema çûkji refê xwe dimîne, dibe qismetê qertelan. U yan jî ji birçîbûn û qefilandinê xwe davêje bextê insan. Di vir de ne dûre têkeve nav lepên pisîkê û yanî nav destê kurekî, ku ji ba Xwedê li nêçîrekê digere. Di herdu halan de çûk wê mirinê bi çavên xwe bibîne... Lê ku hat û tulûrê hur ma bi tenha xwe (li gel ku ev celebên tulûran bê ref in), demek dirêj diponije, heya kêlika ber mirinê bilind difire... Demaji ber çavan dikeve gewdê xwe sist dike û bi kevirê xwe berdide erdê.

U dîsa li ser van tulûran; ku hat û ew ket nav lepên insan? Wê çaxê, gava xwe dibîne di rewşa dîlîtî de xwarinê naxwe heya mirnê. Loma dibêjin ; dema tulûrê hur di cenge de neyê kuştin, ew bi xwe, xwe dide kuştin.

U hene hin tulûrên mîna wan bi gewd û rengê xwe, lê dema dikevin rewşek teng, dest ji meznatîya navê xwe berdidin û mayîna xwe di jîyanê de li ser sergo û beretan didomînin. Lê ku hat û insan ji refe xwe ma, gelo wê çi riye bide ber xwe?. Wê bi çûk be, yan wê bi tulûrê hur be, yan jî wê qertelê li ser bereta be? Ne dûr e, ku wê yê pêşî be, yan jî yê navê be, an jî ê sisiya be. Gelo celebekî din ji xeynî van celebên wê hebe? Gelek karin bi "na" bersivê bidin, lê ezê hewldan bikim ku merovekî bi wan bidim nasîn bi kirasekî din, renekî din û bi navekî din...

Navê wî Windayo bû. Ev nav pêve zeliqî piştî vegera wî ji welatê biyaniyan... Demek dirêj tê ne çû, navekî nuh bi dû ket: Gêjo... Û dûre bê hejmar nav bi dû ketin, dawîya wan; Dîno bû.

Dema Windayo, yan Gêjo, yan jî Dîno dimeşîya, kesên wî

didîtin ji hev re digotin:

-Lê bîner, malxerabo serê xweji erdê ranake! Tu di bê qey tim û tim li tiştê digere, li tiştê, ku wînda kiriye.

Piştî van gotinan navê wî ma Windayo.

-Lê bîner, mîna gêja dimeşe. U evjî, ji xwarina goştê berêz û ilmê şeytanî ye.

U hin kes hebûn digotin:

-Xwedê muînçê wî be. Jin û zarokên wî pê re nehatin. U li vir jî kar û cî ji xwe re nedît. Ne dût e, ku aqilê xwe berde. U di dema dawî de, zarokan, bi hê-hê û kevîran bi pey diketin.

Windayo ev gotinên han dadîqurtand û di ber guhên xwe re berdida.

Lê nexweşiyên Windayo, ne ev tenê bûn. Iro ji hemû rojan bêtir, wî cîji xwe re ne didît, çimkî namek ji jina xwe girtibû. Name wek hemû naman, lê çar sûretên zarokan di navde bûn. Li bin wan hatibû nivîsandin: "Kîjan ji wan ê te ye? Tê bîra te, te zirt û fortê xwe dikir û digot: Dola me Kurda li hemû derê xwiyaye".

Windayo li yê pêşî nerî hinekji şêwên xwe tede dît, lê dilê wî lê rûnenişt. Di yê dudwan de, çav ên wî bûn, Di yê sisiyan de dev û bêvil mîna yên wî bûn û di yê dawî de çen û enya xwe tede neskir. Lê çiqasî Windayo bêtir li wan temaşe dikir, wîlo jî bêtir dilê wî li wan dişetî.

Windayo xweş nasdikir, ku yek ji wan zarokan ê wî ye. Lê kîjan? Windayo dixwest bi dil û can, bi berê xweyî yekem şa bibe, lê nikarî bû. Dixwest ê xwe hembêz bike ramîsanekê jê

bistîne, lê dilê wî bi awî nedikir. Lewra di wan de didît ê xwe û ne yê xwe û bi vî hawayî zarokê ji piştta wî dibû ne yê wî. Di vir de vegera wî ya welat hat bîrê. Wê çaxê naskir ku dîya wî çûye heqîyê.

Evarî ji hevalê xwe re got:

40

-Tu zanî li ku dîya mi veşartine?

Hevalê wî bi "erê" bersîv da.

Li ser mezel, ew û hevalê xwe demek dirêj di nav tirban de gerîyan, lê hevalê wî bi ser gora dîya Windayo venebû. U dema jê pirsî:

-Ma te nedît li ku veşartin?

-Belê min dît, lê gelek tirb niha li dorê çêbûne û dilê min li van herçar tirban dişeete.

Wê çaxê jî Windayo nikarî bû, bi dilê xwe bigrî li ser tirba dîya xwe. Her û her giryê.wî di gerdenê de ma. Windayo gelekî dixwest bi dîya xwe re bipeyive: "Yadê! va ez hatim, ma çima tu li bendî min nemayî? Yadê qusûra min efû bike, û têxe bin nigên xwe." Lê Windayo ev peyv negotin û riia çav zuha û dilhişk û polî poşman veogerîya malê.

Heger tu li sikakên bajarê me bigerî, bêguman, wê Windayo pêrgî te bibe. Hîn serî li ber û çav li erdê, tu dibe qey li tiştêkî digere. Heger hat û te silav lê kir, wê silava te veogerîne û ji te bipirse:

-Raste, ku teht ji ciye xwe bileqe, tucarî nikare şûna berê bigre? U gelo raste genim di nav ceh de ne kêmî zîwanê di nav genim bi zirare?

Windayo li bendî bersîva te namîine, çimkî wê bifiskilîne

û çivekê bide xwe. Dûre dilşewatî borîni pê bikeve.

Ma gelo dîn digrîn?

41

SERPÊHATİYÊN KALO

Di qontara çiyê de, piştî rakirina kevirên mezin û nehîtan, lêkirina benê ji wan, danhevdana zuxuran û çêkirina şikêran; piştî birîna deviyar û hûnandina sincan li ser benê; panavek nuh paqijkirî mîna zolekê li bedena çiyê ciyê xwe girti bû. Di vê zolê de xerzikek du salî şax û baxên xwe bi haritî berdabû. Dihat xwiya kirin miqatîyetî û hostayetiya xwedî wî.

Ev tiştên han ji dûr ve xwiya dikirin. Dema min nêzîkayî lê kir, min dît kalekî heftê salî, piştixûz, rî sipî û dêmekî miştî qermîçokên bi salan, bi devekî bê diran silava min vegehand.

42

Kalo bi çavekî kirîne li min temaşe kir. Ez jî bi şal û şapik bûm, rextê li min pêçayî, klaşşînkovek li milê min, bê ku ez xwe bidim nasîn, dihatim naskirin bi pêşmergetî. Kalo piştî nerîna xwe ya tûj û dirêj ji min re got:

-Kurê min xwiya ye ti rêwî yî, te rê şaşkiriye û ji hevalên xwe mayî.

Min bi şanazî û sermeznayî lê vegehand, daku xwe pê re bidim naskirin.

-Ez pêşmerge me û ciyê me ji vira ne dûr e...

Kalo bi çavekî matmayî li min nêrî û got:

Pêşmerge li ser herdu çavên min in. Lê ji bo çî hûn li van deran digerin? -Kalo bê ku bersiva min bibihîze gotina xwe berdewam kir. -Wiqas sal ez li vir im, tu carî axa me xwe bênamûs

nekir û nigên leşkerên hikumetê pê lê nekirin... Ma gelo tu alay û tabûrên wan hatine van dera?

-Na kalo, niha jî tabûrên leşkarên hikumetê li vanderana peyda nabin.

-Lê we xêr e kurê min?

Piştî rawestinek ne dirêj min jê re got:

-Em li "caşan" digerin.

-Li "caşan"? -Kalo gotina min bi pirsî vegerand.

-Erê Kalo h "caşan", ewjî xayinên millet in, tevî ku ewjî bi navê kurdayetî ban dikin.

Kalo cardî bi matmayî li min nêrî û piştî mijûlbûnek nederêj got:

-Ji kalkê xwe re bêje kurê min, mero çilo weji hev nasdike?

-Binavan... Hegerewnejimebinûşerêmebikin... Mana xwe "caş" in.

Kalo ji min pirsî:

-Ma ew navê we dikin çi?

Di dilê xwe de min got, "heye tune ye ev kalê han bi" caşa" re ye, yan çima baweriya xwe bi ya min nayne û peyvê qut na-

43

ke." Ji bo wilo min bi awirên tûj lê nêrî û got:

-Helbet dijmin wê navên pîs li me kin, ji bo ku avê li ser xwe zelal bikin.

Kalo bi dilşewatî pirsî:

-Kurê min we gelek ji hev kuştine?

Bê hemdî xwe min serê xwe berda ber xwe û got:

-Gelek...

Kalo bi gotina min re rûnişt, cixare pêça û pêxist, hilmek

li ser hilmekê kişand û piştî keserek bi axîn peyivî:

-Ez nizamim rast e, ya derew e... Lê dibêjin di quranê de heye... Li gora gotinên melan hemû tişt di quranê de heye.

Neyse... te çîroka Yûnus Pêxember bihîstiye?

-Ya ez zanim pêxemberek tenê heye, navê wîjî Mihemed e. Kalo di ciyê cî de got:

-Ela hume selî ela muhamed... Lê kurê min dibêjin sê sed û şist pêxemberên din hebûn; yek ji wan Nebî Yûnis bû... Bêdeng min serê xwe hejand û kalo peyva xwe berdewam kir:

-Ev Nebî Yûnis, heft salan di zikê hût di binê dengizê de ma bû... Piştî heft salan xwedayê alemîn wî rût û tazî avête devê dengizê. Wilo çermê wî tenik bûbû merov hestiyê wî tê re didît. Nebî Yûnis gava çavên xwe vekir xortekî çarde salî bi herdu çavan kor dît. Koro destên xwe dipeland, ku têkeve ser riya rast. Nebî Yûnis destê xwe bi alî Xwedê vekir û got; "Ma Xwedawo gunehê vî kesî çiyê, ku te ji biçûkayî de wî kor kiriye? U tê bi qedir û izeta navê xwe kî, tê çavên wî sax bikî." Xwedê teala dua Nebî Yûnis bi cî anî. Xortê kor dît xwe nedît ji nişkave herdu çavên wî vebûn. Hema di ciyê cî de rapelikî xwe. Dema çavên wî li Nebî Yûnis ketin, koro yek nekir dudu rahîşt zuxirên ser devê dengizê û bi tepiza bi Nebiyê Xwedê ket. Laşê Nebî Yunis wiha tenik û nazik bûbû, mîna tiliyê mêtayî, çawa tepiz dihatiyê wilo jî di laşê wî de diçû
44

xwar...Nebiyê Xwedê tiştik li ber nema xeynê bêje; "Xwedêwo ti bi karê xwe zanî. Heger te nizanîba te ew kor nedikir."

Piştî vir Kalo demeke dirêj bê deng ma û ez jî mam heyîrî

çi bêjim. Gelo ji bo çi wî ev çîroka han got. Kalo ziq li çavên min nêrî û tê derxist ku min meqседа çîroka wî nasnekir. Wî da xwe û rabû ser xwe, wek kesê ku bêje: "Tu here bi riya xwe de û ez jî karê xwe bikim." Kalo bi rabûna xwe ji min pirsî: -Ma gelo ti nizanî heger xwedê Kurd bikirana tiştê ti dibê wê dinya xera nekirna?

Bi vê gotinê min mebesta Kalo naskir, berê xwe da çiyê, ciyê ku me lûsê xwe lê çêkiribû...

Wê şevê xew neket çavên min. Her û her Kalo mîna rewrewka li ber çavên min diçû û dihat. Gotinên wî li ber guhên min dikirin vin-vin wek pêşiya ku girê xwe firotiye kesê xewxwaz.

Sibehê, bi rojhilatê re min berê xwe da Kalo. Min ew dît mîna dîtina meji hev re cara pêşî. Dema min nêzîkayî lê kir, Kalo pêjna min kir û pê re jî serê xwe rakir. Awirên me li hev ketin. Nayê bîra min Kalo silava min vegerand, an na, lê xweş tê bîra min, Kalo pêre-pêre wek mozqirtkê bi min veda, dema got:

-Kurê min heger ti bê karî...Kar li cem min tune.

Bi rastî min nizanîbû çibikim. Heger ne ew ba, ji xeynî vegeê tu rê li ber min nediman. Lê kalo mîna ji gotina xwe vegere bi tuneke din peyivî:

-Tu xwendevan î? -Bi kurtî ji min pirsî û min jî bi kurtî lê vegeand-:

-Erê.

- Madem wilo, pirseke min heye.

-Fermo, -min bersîv da û di nava xwe de got: "Gelo kalo wê çi bipirse?"

-Ti zanî çima emji dîkê mirîşka re dibêjin; dîkê Kurman-
45

cî? Navê wî li hemû derê dîk e, lê li cem me Kurda "dîkê Kurmancî"
ye Çima gelo?

Bi rastî di dilê xwe de ez bi Kalo keniyam. Bê yî ku mebesta
wî zanibim, min lê vegerand:

-Na, Kalo ez nizanim. Lê çi eleqa xwendina min bi dîkê
mirîşka heye?

Kalo dîse bi awirên bêbawerî li min nêrî. Bi alî min ve hat
û rûnişt. Bi rûniştina xwe re da xwiya kirin, ku ez jî rûnê.
Wî destê xwe avêt kîsê tutinê... Min rê nedayê, ku cixara xwe
bipêçe, lewra cixara pêçayî min da dest û pêre jî agir pêxist;
da ku cixara xwe pêxe. Kalo mîna cara berê hilmek ji dil kişand.
Dû di qulên bêvil û devê xwe re berda. U dûre peyivî:

-Kurê min eleqa xwendinê bi her tiştî heye. Kesê xwendevan
dibê her tiştî zanibe. Yan na çi ferqa min û te heye? Kalo
li dora xwe temaşe kir û awirên wî li ser asîman man û sekinî.
Lê dom nekir, berê xwe da min û got: Heger tu gundiyî dibe,
ku te dîtiye çilo dîkê elokan û yên mirîşkan pevdîçin.

Min lê vegerand:

-Ma gelo kî ji Kurdan ne gundî bû?

-Baş e, tevî wilo jî hinin hene, ku gundayetiya xweji bîr kirine...

Ne dût e ti ji wan yekan bî. -Min serê xwe bi "erê" hejand,
Kalo berdewamkir: Heger ti dîna xwe bidî pevçûna dîkê
mirîşkan bi dîkê elokan re tê bibînî, ku dîkê mirîşka erê bi
qelafetê xwe biçûkin, lê zora dîkê elokan ên bi qelafet dibin.
Ne tenê wilo, yek zora çend heban jî dibe. Lewra dîkê elokan
alî hev dikin... U belengazê dîkê Kurmancî bi tena xwe şer

dike. Bi rastî ti zanî -Kalo dengê xwe hîn bêtir bilind kir û got
-Dîkên elokan ên li wir tên alî hevalên xwe lê dîkên kurmancî
hîç dîna xwe nadin ser hevalê xwe. U feqîro ji bêçareyî direve,
çimkî nikare li hemberî wan bi tena xwe bisekine. Erê birazî
dîkê kurmancî çiqasî mêrxase jî, lê nikare bi tena xwe
piştadijminbişkîne... Maneheqbû, ku navê wî bi navê Kur-
46

manca ve hat girêdan?!

Bê pêjin ez rabûm ser xwe û hêdî hêdî min berê xwe da çiyê.
Piştî ku ez texnekî çûm min li dû xwe nêrî, min dît Kalo bi
piştuxzî karê xwe berdewamdike di nav xerzikê nuh-hatî de..
Erê ez çûm ciyê lûsê me, lê pişt re devê tivinga min ne kete
sînga tu Kurdî.

47

ŞAÎROKO

Di quranê de hatiye; "heger xwedê bêje bibe, wê bibe..
"Madem Husênê Reşîd bû helbestvan, bêguman tiliya Xwedê
Teala tê de heye. Lewra Husênê Reşîd di jiyana xwe de
helbestek ji ber nekiribû. Bi gotinên heval û hogirên wî yên
dibistanê; bihna şîran neji dûr, neji nêzîkjê nedihat. Lê tevî
wihajî Husênê Reşîd bi helbestvanî dengda.. U ev navdariya
han jî ne bi derewa bi du ketibû..

Rqjekê ji rqjan Husêno (wiha bang dikirinê berî bi helbestvan
be) hat nav hevalên xwe û bi ghiştina xwe şîrek ji
wan re xwend.. Hevalan xwendina Husêno ji şîrê nekirin
48

tîşte. Lê Husêno ew matmayî kirin dema got: "Ev qesîda
min e."

Her çiqas heval û hogirên wî jê bawer nekirin, lê kesên ku bi helbestan mijûl dibûn, di vê qesîdê de çêbûna şaîrekî nuh û bi berhem dîtin. Helbet Husên Reşîd peyvên bi pesin li ser xwe dibihîst. Loma di qonaxa mehekê de çar-pênc şîrên din belakir... Di vir de tu tişt li ber hevalên wî yên ku jê behwer nedikirin, nema xeynî bêjin: "Heger Xwedê bide yekî nabêje tu lawê kê yî." Lê kesên ji helbestan fam dikirin, gotin: "Ma meji we re negot, ku şaîrekî nuh û baş di nav milletê me de ra bûye!"

Piştî van peyvan, Husênê Reşîd kete nav rêzên hozanên welat.

Husêno nema yê berê bû. Ne tenê bi guhertina navê xwe, lê bi guhertina dan û stendina, heya bi kinc û tûnê xwe jî. Di demek kurt de riya xwe berda û dûre por jî...

Guhertina Husên Reşîd dihat xwiya kirin di paye bûna wî de. Loma xelkê di nav xwe de rexne lê dikirin û digotin: "Ev paye bûna han wê wî bikuje." Tevî ku helbestvan ev peyvên han dibihîstin jî ji paye bûna xwe danediket û gotinên xelkê li ber guhên xwe berdida.

Diya Husêno, di destpêka helbestvaniya kurê xwe de ji kêfa re cîji xwe re ne didît. Dê li pêş pîrekên cîranan xwe bi Husêno mezin fikir. U pirên caran jî pesnê wî ji wan re dida û digot: "Roja roj min zanî bû ku Husênê min ne wek bira û hogirên xwe ye.. Lê niha stara Xwedê lê be ti di bê qey wehî tê ser..." Dê gelek caran diçû oda kurê xwe, destê xwe li ser porê wî dibir dianî û digot: "Ez qurbana Şaîrokê xwe bim!" Lê niha piştî ku Husên bi tenha xwe bi şev û rojan di oda xwe de bê xwarin dima û xewa cîranan li wan diherimand,

dema bi qîrinên xwe di şevên lal û zîz xelk ji xewa şêrin radikirin,
Dê li xwe dixist û ji kurê xwe re digot: "Ne em bin ne

49

ev şaîrbûna te be!..." Di rojên dawî de dê bi dizîka diçû ziyaretan
û xwe davêt ûcaxên ewliyan, dako kurê wêji nexweşiya
şaîr bûnê rehet bibe.

Heqê dê hebû, bixurcile û li lawê xwe bipirse li cem şêx û
ziyaretan. Lewra di dema dawî de, nema peyv bi Husêno re
dibûn. Da ya rastî wî xwe dûrî xelkê û kesên malê dikir. Wê
dilê dê di cî deba heger kurê wê li oda xwe rûniştiba. Lê carcara
wî dê bê hal dikir..

Diya Husêno rewşa kurê xwe wiha ji cîrana re dida xwiya
kirin:

-Mirîşk dire ser motkê,.. Piştî hêkê, dike qidqid.. Lê Husêno
her tenê qidqidê dike.

Heger bi tenê gotinên dê bipeyivin emê bêjin ev sê raje ku
Şaîr Husênê Reşîd çû bû lûsê xwe.. Geh bi hewar û geh bi qîrqîr
deng jê dihat. Carna j î bê pêjin dibû.. Kesî nizanî bû çî
di hundur de pêre diqewime. Herkesî bi hewakî texmîn dikir.
Helbet hemû bi texmînên xwe re rastbûn,çimkî nizanîbûn
dîroka helbestvaniya wî...

Di oda xwe de Husênê Reşîd defterek kevnare pel bi pel diqulupand,
dako helbestekê bibîne, ji xeynî yên ku belavkiribûn.

Lê bê fêde bû. Di vir de tu tişt li ber Husêno nema, xeynî
ji îro pêve şîira bi xwe çêke. U cara pêşî piştî dîtina wî ji
deftera helbestvanekî nenas poşman bû bû. Di ber xwe de digot:
"Xwezî min ev defter nedîta û navê şaîrtiyê nehata ser
min!"

Peyva Husêno rast bû ku wî deftera şîra dîtibû. Rojekê ji rojan, gava wî hewş dikola dako darekê biçîne, li ber merê tenakak zingarî mişt defter û belavok derket. Helbet Husêno nizanî bû ev çine û yê kê ne. Lewra heyamê veşartina vê tenekê hîn ew zarok bû. Li gora peyvên Dê êvarekê çend kesan mîna çûkên ku ji ber başoke birevin xwe avêtibûn mala wan. Bi gotinên wan ew "xwînî bûn" Dê û bav ew hewandin, çim-

50
kî dilê wan dişetî, ku ev rêwiyên han xwiniyê hukûmetê ne. Piştî nivê şevê yekî ji wan bi dizîka belavok û deftera xwe di tenekê de xist bin zikê erdê, bê ku ji xwediyê malê re bêje.. Di destê elindê de beta weta bûn. Pişt re tim û tim Dê digot: "Ji bo çî wan rêwiyên teneka me dizî ez nizanîm. Çima tiştêkî din ne dizî?" Çîroka wan kesa Dê ji xelkê re deh carî kiribû

..Çaxa Husêno tenekê dît, dilê wî reelî, çimkî hevî kir ku bi ser xezînekê ve bûye.. Ji bo wiha, ji kesî re negot û bi dizîka teneke anî hundur, derî kilît kir û li tenekê geriya. Dema tiştê ku dixwest nedît, bi xeyd kaxez qetand... Tenê li ser defterê sekinî, çimkî xwest nas bike çî tê de hatiye nivîsandin. Defter mişt helbest bûn. Husêno defter hişt û belavok şewitandin. Helbet Husêno, destpêkê bîr nedibir bi van helbestan xwe bi şair ke. Tenê bala wî lê bû ku heneka bi heval û hogirên xwe bike. Lê dema qesîdak kir a xwe, bayê navdariyê li bêvilê xist û serxweş xist.

Husêno bi rojan, heya qesîdak ji ber fikir. Dûre ji ber defterê dinivîsand, dako dizîya xwe veşêre. Uji bo ku rûreş dernekeve, berî bela bûna qesîdak nuh mana peyvên nenas ji kesên

zane dipirsî. Piştî bi matmayî digotin: "Gelo çima Husênê Reşîd pirsî peyvên, ku di qesîda wî de tên dipirse?" Wan jî li xwe vedigerandin: "Dibe ji bo ku wan bi cî bîne di qesîda ku di serî de maye."

Piştî temam bûna deftera qesîdan, Husênê Reşîd sê şev û sê roja ma li hundir heya bi xwe qesîdek çêkir. Ji çend malkan bê mane û qafiye, lê tije peyvên nuh û qelew. Kêm kesan manên wan peyvan nasdikirin. Dema li ser vî tiştî jê pirsîn:

-Mamosta tu nabînî, ku qesîda te, ya dawî bi rengekî din hatiye nivisandin?

51

Husênê Reşîd di bin sinbêlan re dikeniya û digot:

-Em Kurd tucarî nabin tiştêk. Her û her diva be em mîna berê bijîn. Ma gelo hûn nabînin, ku dem hatiye guhertin û pêwîste em ji helbestên kilasîkî xelasbin?!

Guhdarên wî serê xwe bi erê dihejandin.

Di qûnaxa duduyan ji helbestvaniya xwe de, Husênê Reşîd, rîj bi roj dan û stendina wî bi meriv û xelkê re ne xweş dibû. Bi temamî navê dînîtiyê hate ser, gava şevêkê şilfî tazî ji oda xwe derket. Dost û merivan bi dijwarî ew di nav sikakê bajêr de zeftkirin. Wî jî bi felbazî digot:

-Min binixumînin.. Ji bo Xwedê min veşêrin..Ne dûre ku helbesta ku îşev min çêkiriye gelekî giran û dijware...

Tevî wihajî Husênê Reşîd hîn nivîsandina xwe berdewam dike, di warê helbestên hur û bê qafiye. Diya wî hîn ji pîrekên cîran re dibêje:

-Xwezî ne bi rîja ku Husêno bû Şaîrko.

52

SERXWEŞ

'Di darê dinê de, kesî ez ne êşandim,
mîna nefsa min."

(Jipeyvên hozanekî)

Rojekê ez li mirovekî rast hatim, min di xortaniya xwe de,
bawerî û hêviyên xwe têde didît. Li meyxanekê min ew dît.
Rihek tofû ne paqij rûyê wî heya ber çavên wî girtibû. Çavên
wîjî xar bibûn û di koncalên xwe de çûbûn xwar. Madê wî yê
zerhimî bi rengê xwe mîna yê miriyabû. Bi kurtî ez pêrgî

53

serxweşekî bûm, ku tişteki wî û navê insan bi hev re nemabû.
Bi gotinek din ew bi xwe mabû rewrewka insan. Di jiyana
xwe de rojên xwe dispartin hev û dibuhurandin di parsekiya
çend dilopên meyxweşê de. Yan jî digeriya û dima li wan ciyên,
ku wê kariba gulpek meyxweşji binê piyalekê yan jî şûşekê
vexwe...

Min ew dît,ku bi vê dilêma xwe ya rojenî radibû. Piştî lêgera
xwe li ser masan, ciyê xwe li teniştê qumarciyan girt. Bi
hawakî wiha li wan temaşe dikir, mirov digot qey hinan jî
wan li ser malê wî dilîstin...

Ji destpêkê min qilawizî lêkir. Çavên min lê ketin, gava dilopên
mayî di binê piyal û şûşan de bi ser xwe dadikir. Pişt re
min bi awirên xwe da dû, heya ew bi ruh û canê xwe di lîska
qumarciyan de winda bû. Ev rewşa, ku min ew têda dît hişt
pêlên tevizînok, seyrê û matmayî bi ser min de bîn. Lewra
ew kesê bi nav û deng ketibû jiyaneke ne qenc. Xwestina naskirina
sedema serxweşiya wî çiyê, yan jî kiye, di dilê min de
hate xurcilandin. Daxwaza, ku ez pê re bipeyivim bi min re

mabû, çimkî di dema dawî de ew bibû benîştê devê xelkê. Nifşekî digot: "Ji cengê reviya û bizdoneke." Celebekî din ji xelkê digotin "Bê ewle bû û ev babetê wî ye." Carna jî bi van xeberan dihat ricimandin: "Li esl û fêslê xwe vegeriya." Erê min gelekî dixwest ez pê re rûnim da ku ez nasbikim niha ew bi çî zimanî dipeyive. Gelo gotinên wî mîna rengê wî hatine guhartin. Loma min dej masa xwe berda û berê xwe dayê. Dema ez ghiştim cem, min destê xwe bi dilovanî li milê wî xist, heya min çend carî nekir ji xarbûna xwe, ya hişdana lîska qumarciya hişyar nebû. Li min bi giranî zivirî û bi çavên bê ruhnî li min nêrî. Min jî, nerînên wîji hev dernexistin, gelo bi xeyd bûn an jî bi riza bûn. Dîsa zivirî ser lîskevana bê ku ji min bipirse ez doza çî lê dikim. Min jî dîsa destê xwe li milê wî xist. Vêga li min zivirî û min di çavên wî de xwend:

54

"Çî tu ji min duxwazî? Dej ji min berde." Heyaji min hat bi dilsozî min ew ezimand ser masa xwe û min jê re got:

-De ka em bi hev re vexwin.

Bi peyva xwe re min destê xwe bi alî masê vekir.

Li serê min heya nigên min nêrî. Ji liclic û doza min, bi tewtihandin dej ciyê xwe berda û me berê xwe da masa min.

Ji nişkive bi dengê ricricî got: "Innema elxemrû welmeyserû welezzamû welensabû ricson min emelişeytanî fectenibû."

Bi bihîstina vê ayeta quranê ez mam matmayî, lewra cî ne ciyê xwendina quranê bû. Lê min li xwe dernexist û min da xwiya kirin, ku ez wî nabihîzim. Hîn em ghiştin neghiştin hema destê xwe avêt piyalê û bi ser xwe dakir, a rast meyxweş avêt nava xwe. Pişt re destê xwe avêt şûşê û gulpekji wêjî vexwar

û da xwe ku vegere. Lê min ew sekinand û jê re got:

-Ez receyê ji te dikim tê bi min re vexwe, çimkî ez hez ji vexwarina bi tena xwe nakim.

Pêşî li min nêrî dûre li şûşê, mîna yê ku bêje "têra me herduyan nake."

Min mebesta wî naskir, loma min şûşak din xwest. Madê wî vebû û pêre rûnişt. Bi rûniştina xwe destê xwe avêt xwarinê.

Gepek xist devê xwe û wî xwar, nego dilê wî dibijiya xwarinê.

Min jî dixwest ez jê bipirsim li ser xwe, gelo ew min nasdike yan na. Lêji tirsas ku ez bêm bîra wî û dej min berde min jê ne pirsî. Lê min jê re got:

-Ez dibînim tu hebckî westiyayî... Alîkarî ji te re divê?

-Alîkarîji min re? Bi lez peyva min vegerand bi hewakî pirs û matmayî, awirên xwe li hawîdor gerand û bi dengê hêdî ji min re got.

-Tu bi çi karî alîkariya min bikî?

Min bawer nedikir ev serxweşê han kare xwe bigre û bi vî hawayî bipeyîve, min jî mîna wî bi hêdî lê vegerand:

-Muhtaciya te çi be ezê biqedînim.

55

-Naxwe tu dixwazî alîkariyê bi min re bikî... Naxwe wilo!

Ha.. Ha.. Ha.. Bi çi gelo tê alîkariyê bi min re bikî? Naxwe tu Xocayê Xizirî... Yan jî tu Mihdiyê dawîya zemanî...

Ez bi gotinên wî dihesiyam mîna kevira bi ser min dawîşînin:

Erê min naskir ku ew qerfê xwe bi min dike. Heger garson wê bîstikê meyxweş neyna, wê rewşa min ne xweş biba.

Wî bi xwe şûşe ji dest girt û pêre pêre bi ser xwe dakir. Pişt re destê xwe avêt pakêta min, cixarekjê kişand û min jê re pêxist.

Hilmek dirêj kişand û got:

-Muhtaciya min bi vî tiştî heye, -Min naskir ku mebesta wî cixareye, dûre destê xwe bi aliyê şûşê vekir û got:U evjî, lê tiştên din vala ne.

-Dûre bi tonek din peyivî: Tu zanî ji zûde ez pêrgî merivekî mîna te nebûme. Dibe ku tu ji dinyak din hatibî?

Min bersîva wî neda. Ewjî ma bêdeng. Dûre awirên me li hev ketin. U çavên xwe xistin çavên min û zîq li min nêrî bê ku mijankên xwe bişkîne. Min xwest ez ji awirên wî birevim, lê min rê ji xwe re nedît. Di virde min bawerkir ku wî min naskir. Lê şûna tişteki bêje wek dîna keniya. Min nizanîbû wê dawiya wê çiba heger kuxikê hişk ew ne girtiba. Bi vê kuxikê bêhn lê hat çikandin. Ez herbilîm, şaşbûm û mam sar li ciyê xwe. U heçî li meyxa nê guh nedan me. Tenê, piştî xurcirek dirêj bi kuxikê re hêdî hêdî bêhna wî hate ber. Dure bi dengekî melomirarî ew peyivî:

-Te dît birako, heya di vê musîbeta biçûk de te nekarîbû alîkarî bi min ra bikra!

Deng ji rne herduya biliya. Ji nişkave ricfekê ew girt. Ne ji virde û ne ji wirde pirsî:

-Tu zendikî, ku ez dînim, ne?

Min serê xwe bi na hejand.

-Na... Ez bawer nakim, çimkî hemû min dîn dihesibînin.

Belkî tu ecêbmayî bibînîheger ezji te re bêjim ku gotinên xel-

56

kê li gora dilê mine... Erê bi rastî jî ez dixwazim, ku ez wihabim.

Lê mixabin! U bîr û baweriyên min ewin, ku serxweşbûn

rengê ji rengê dînbûnê ye. Loma jî ez vedixwim...Erê

ez vedixwim da ku ez xwe winda bikim. U ku ew nebedî bibe
-Destê xwe bi alî şûşê vekir- ezê pêrê nebedî bibim ji dinyê.
Tişteki xerîbe îro çiqasî vedixwim ez serxweş nakevim û xem
û kederên min hîn bêtir gur dibin. Bê ku ez zanibim çima, dilê
min li te rudinê... Rojaîro şîûrek wiha min girtiye ku nahêle
kelegirî ji qirka min derkeve... Erê ez dixwazim bigrîm bi
dengekî bilind. Ax ez çiqasî dixwazim di himbêza diya xwe
de bigrîm... Di himbêza yarka xwe de... Di himbêza dostê
xwe de...

Piştî van peyvan Serxweşo serê xwe danî ser masê û ma bê
pêjin. Xem û kederê girt ser me. Min xwest wî himbêz bikim,
lê rê min têde nedît.. Ji nişkêve serê xwe rakir, bê hemdî xwe
min piyalek da dest, wîjî bi ser xwe dakir û devê xwe bi zendika
xwe paqij kir. Bi dengekî xemgînî peyv berdewamkir.

-Erê pirê cara ez dixwazim bigrîm. Helbet ez dixwazim
bigrîm, ne ji bo ku xelk li min bîn şefeqê, lê... Di vir de sekinî
û ji min pirsî: Tu dixwazî, ku ez çîroka xweji te re bêjim? Erê
çîroka min, nemîne ecêbmayî, lewra her insanek çîrokek wî
heye... Sitiranek wî heye, wê bêje û wê here... Lê çîroka min
di pêçekê de mir... Erê birako herkes sirudek wî heye divê ew
belabike, lê ya min di zengelokê de ma... Tu bawerdikî min
digo ezê sazekê wiha deynim ku kesî berî min ne lê xistiye û
ne bihîstiye... Lê...

Dîsa ma bê deng û cara pêşî di vê rûniştinê de, min naskir
ku "mêvanê" min bi zimanê xwe dipeyive... Lê bê ku ez zanibim
çima germbûna gotinên wî ne gihîştin dilê min...

-Tu min fam dikî? Serxweşo pêyva xwe berdewam kir. Ez
ditirsim tu ji min fam nekî.

Dîsa bêdengiyê em girtin.

57

Min hez ji keçekê dikir.-Serxweşo ne ji virde ne ji wirde
dest bi çîroka xwe kir- Te tucarî hezkiriye? Ev ne giringe, kes
tune ku bi nexweşiya evînê neketiye. Lê hezkirina min ji celebekî
din bû. Erê min hez ji wê dikir û wê jî ji min -Bi kêmanî
min digo qey hez ji min dike.- Heya, roja xwestina wê hat.
Min destê wê xwestji bav û birên wê, wanjî muwafiqiya xwe
dan... Helbet wêjî muwafiqe kir. U dawiya dawî roja guhestinêjî
hat.-Di virde behna serxweş çû û hat, gotin di zengelokê
da ma, serê xwe xist nav destên xwe û ponijî, miri jî nexwest
wî bixurcilînim heya ew bi xwe çîrokê berdewam bike.
-Erê -Ji nişkive Serxweşo bi hêrs peyivî- Roja dawetê hat.
Di eynî rojê de hinin kes hatin û dergistiya min revandin...
Na ne revandin, lê birin mala me ji zavaî din re... U ez hiştim
li ber derî, da ku ez di qula derî re binêrim, wê çewa dergistiya
min ji keçikanî bikeve.- Peyva dawî ji devê wî derket
derneket, heya qîrînî bi Serxweşo ket. Bi barînek dînîti got:
-Ew çi hov bûn û ez jî çi bêrûmet bûm...
Di vir de ew hêç ket. Min xwest wî haj bikim, lê fêde nekir.
U gava min jê re got "Emê heyfa te hilînin" di ciyê cî de sar
ma û rengê wî hat guhartin, reş xeniqî. Bi nêrînek wiha li min
nêrî tu di bê qey min bavê wî kuştibû. Hema agir ji çav û devê
wî dibariya. Bi vê tonê jî bi ser min rabû:
-Nexwe tu ji wan î! Tu çi marê korî, te dixwest bi dilopek
araq jiyana min a mayî ji min bidizî... Tu... Erê tu, yê wek
te -bi hêstirî kulma xwe li masê da. Mîna lokê hêç kef bi devê
wî ket û rabû ser xwe. Berî ku here paçê bin xwarinê kişand.

Li erdê sênî û piyal li hev ketin.- Erê hûn in ên ku we ez bê bawerî kirim. Laneta şeytên li we bê.

Min xwest wî bi xwe bidim nasîn lê bê feyde bû. Çiqas ez bi aliyê wî dihatim hîn bêtir har dibû. Heb heb dûrî min ket.

Li ber derketinê li min zivirî û got:

-Tifû li te û alîkariya te be û xwarina te be.

58

Dûre çû û her gavek davêt li min dizivirî û tifi alî min dikir heya ji ber çavên min ket...

59

BISTIKEK BÊ RÛMET

Remo mîna rêwiyên din di rêzê de li bendî dora xwe ma. Kesên ku dora wan dihat bi serfîrazî pasên xwe didan polîs û piştî nerînek bi nav nerîn polîs dîsa pasên wan li wan vedigerand. Rêwî derbasdibûn, bi riya xwe de diçûn. Tenê Remo bi tirs destê wî li ser dilê wî bû. Di nava xwe de diqîçiqî û dikelkilî, dixwest hîn bêtir rêz dirêj bibe, da ku dor negihê wî. Tevî ku zanîbû çare nabe, mîna ku dora mirinê tê ser însan wê dora wîjî bê.

Dema li pêşiyê yek-du kes man Remo çend gotinên ku bi zimanê îngilîzî ji ber kiribûn; di ber xwe de ducarî kir. Gava

60

dora wî hat, wî bi awakî nîvşareza got:

-Eyam Kurdeşin Polîtîk.

Polîs bi pirs lê vegezarid, çimkî gotinên Remo yên îngilîzî bi hawakî ne duristî derketibûn:

-What?

-Eyam Kurdeşin polîtîk.

Vê carê polîs bi çavên kirîn û nebaweriyê lê temaşe kir.
Awirên xwe ji serê Remo ta nigên wî bir û anî. U bi hawakî
wiha lê temaşe kir, ku Remo bê hemdî xwe serê xwe bera ber
xwe da.

Herdu demekê li ber hev bê deng man. .. Remo dîsa da xwe
ku bipeyive. Lê zimanê wî herbilî û ma bê pêjn. Lê dît polîs
her û her awirên xwe jê nabire, nemazeji nigên wî. Heya dilê
wî lê şetî: "Ma xwe ne ez ji teyarê xwas peya bûm?"

Dinya li ber çavên Remo çû û hat. Ji wî werê ku kesên li dorê
hemû lê dinêrin û li ser bi hev re dipeyivin. Li ber çavên
wî bû rew-rewk. Ken bi bilindî û gotinên jê nenas tevî hev
bûn. Ji nişka ve ricfek kete dilê wî. Bi xwe hisiya, ku tilîkên
nigê wî şil bûn. Nema zanîbû ji xwêdanê ye yan jî...

Di vir de serpêhatiyek ji zaroktiya wî hate bîrê. Wê çaxê temenê
wî şeş-heft salî bû. Dem çelê fal bû. Çiyayiya ji bêkarî
yan bi xara dileyistin an jî kenê xwe bi Hesênê Dîn dikirin.
Evê dawîji zikmakî kêma aqil bû û di xortaniya xwe de bi dînîti
hat nasîn. U ne wiha ev nav hate ser. Hesênê Dîn û reben
di berfê de, di germê de xwas dimeşiya.

Di garsîna gund de, erê rokê tîrêjên xwe diavetin erdê, lê
her ava golan qeşa xwe bernedida... U te digo qey ev tîrêjên
han bê tînin. Tevî wiha jî xelkên bêkar xwe avêtibûn tengala
dîwar û sincan, da ku hinek germê di laşê xwe xin. Tenê Heseno
ji serma xwe ji ser nîgekî davêt ser ê din. Remoyê biçûk
li teniştava bavê xwe matmayî lê dinêrî. Dûre xwe negirt ji bavê
xwe pirsî:

61

- Yabo... Wa yabo çima nigê mi di gora û çaroxan de dicemide,

lê Heseno xwase jî ne xema wî ye?

Bav negihîşt lê vegeerîne, lewra yekîji zilaman ban Heseno kir û jê re got:

-Heseno, heger tê bidî nav golê, ji serî heya binî ezê mecidîkî bi te dim.

Kesên li wir Heseno sor kirin û wîjî yek nekir dudo, şerwalê xwe kişand heya kabokan û da nav qeşê. Bi derketina wî te digo qey te nigên wî daye ber qelemtiraşan. Hawîdorê xwîn deherikî. Zilamê ku ev doz li Heseno kir jê re got:

-Ez mecidîyê te nadim te. Ma çima te panekî qut kir. Şertê mi ew e, ku ti bi dirêjayiyê lêxî.

Heseno da xwe ku dîsa li golê xe. Di vir de -û heya rîja îro Remo nizanibû çî pê hat. Hima ji ciyê cî êrîşî zilam kir û gezî tiliya wî kir. Qarînî pê ket.. Bû tîqe-tîqa kesên li dorê.

Remo bi xwe şiyar bû dema polîs pirsar navê wî kir. A rast wiha ji Remo hat xwiyakirin, ku pirsar navê wî dibe:

-Navê min Hesênê Dîne -Bi dengê bilind bersîv da, lê di nava xwe de digot: Heger ne dîn bûma, ez dahatim vir....

62

**

BEXÇEYÊ PEYAMBER

Xelîl Cibran

Weşanên Taybet yên

Kovara MEHNAME

Bi hevkarîya li gel:

Weşanên Helwest

© Rêbendan 2004

Husein Muhammed

Û MEHNAME

Ev berhem wek pirtûk di nav Weşanên Helwest de li Swêdê derketiye. Bo xwestina wê:

Lokman Polat: lokmanpolat@hotmail.com

Almustafa, yê bijartî û hezkirî, yê ronahiya nîvroya gelê xwe, li tişrînê ango meha bibîranînê vegeerî warê lêbûna xwe.

Dema ku keştiya wî nêzî bendergehê bû, ew di pozik û pîja keştiyê de bû û deryavanên wî jî li dor wî bûn. Û vegeera malê di dilê wî de bû.

Ew peyivî û derya di dengê wî de bû, got: Binerin, girava lêbûna me. Li vir erdê em welidandin, stran û metelok; stran ji esman û metelok jî ji erdê re. Ma li ser rûyê erdê ji bilî hezkirina me tiştek din heye ku stranê bilorîne û metelok û têderxistinokan çareser bike?

Derya dê vê carê jî me bide van peravan. Em jî di nav pêlên wê de tenê pêl in. Ew me dişîne daku em dengê wê bidin vedan û olandan lê ma eger em qalibê hişkiya dilên xwe li ser zinaran û li nav xîzan neşkînin, em ê çawa bikarin wisan bikin? Ji ber ku ev e zagona deryayê û deryavanan: Eger azadiyê bixwazî, divê tu bibî mij. Yê bêtişê û û bêşikil hertim li tişê û şikilekî digere mîna ku xumam û moran bibin roj û heyv. Divê em, ên ku pirr gerîne û niha vegeerîne, dîsan carek din jî bibin mij û moran û ji yê berî me heyî fêr bibin. Ma tiştek wisan heye ku bijî û hilibikeve jor lê li ber hezkirin û azadiyê neşkê?

Em ê bi abadînî li perav û qeraxan bigerin daku em bikarin lê bistrin û bîn bihîstin. Lê çi ji wan pêlan, ên ku li van deverên kes lê tine dihejin û bihêz in lê dîsan jî nayên bihîstin? Loma di me de bi rastî tiştên nebihîz herî baş kûrtirîn xemên me vedirevînin. Lê dîsan jî, heman tiştên nebihîz teşe didin giyanên me û serkêşiya feleka me dikin.

Paşî yek ji deryavan derket pêş û got: Mamoste, te serkêşiya bêrîkirina me ber bi vê giravê de kiriye û binere ku em gihane bineciya xwe. Lê

dîsan jî tu ji me re basa xeman û dilan, ên ku bişewitin û bişkên, dikî. Wî bersiva deryavan da: Ma ez ji azadiyê û mijê, ya ku mezintirîn azadiya me ye, nepeyvîm? Lê dîsan jî ez têrxem vedigerim vê girava lêbûna xwe, mîna canê yê kuştî ku vedigere daku xwe li pêşberî kujerê xwe bitewîne.

Û deryavanek din peyvî û got: Binere, çawa girseya gel li pindan û benda avê civiye. Di pêwîstiya xwe ya bêrîker de ew ji nav zevî û rezên xwe hatine, di bédengiyê de civîne û li benda te ne.

Almustafa li girseya mirovan temaşe kir, dilê wî hest bi bêrîkirina wan kir lê bêpêjn ma.

Dû re ji nav mirovan qîrînek, qîrîna bîranîn û lava û duayan rabû.

Wî li deryavanan nerî û got: Ma min çi ji wan re aniye? Ez li deverên dûr û xerîb nêçîrvan bûm. Min tîrên wan dayî min bi şan û şoret avêtin lê min ti nêçîr bi xwe re neaniye çimkî ez li pey wan tîran neçûm.

Dibe ku ew tîr niha di baskên şeqandî yên qertalan, qertalên neketin erdê, de li ber perrên esmanan difirin. Û belkî serikên tîran ketibin destên wan kesan, ên ku pêwîstiya wan ji bo xwarinê û meyê pê heye. Nizanim ka ew li kû firîne lê vê yekê dizanim: wan kevaneya xwe li esmanan kiriye.

Çawa dibe bila bibe, destê hezkirinê hê jî li ser min e û hûn, deryavanên min, hê jî bi dirêjîya bînahiya min diseyirin û hê jî ez lal nebûme. Destê demsalan qirrika gewriya min bişidîne jî, ez ê biqîrrim, û pêtên agir lêvên min şewitandibin jî, ez ê dîsan jî strana xwe bistrim. Bi van gotinên wî jan ket dilên wan tevan. Yekî ji wan got: Mamoste, me hemûyan fêr bike û ji ber ku xwîna te di demar û cegerên me de heye, belkî em tê bigihin.

Dû re wî, ba di dilî de, bersiv da û got: Ma we ez, ji bo ku bibim fêrker, anîm girava lêbûna min? Niha hê nîrê awezmendî û aqilmendiyê

nebûye barê min. Ez hê ciwan û cahil im û nikarim ji bilî xwe bi xwe ji tişteke din bipeyivim. Yê ku dixwaze awezmendiyê bibihîze û bibîne, bila ji nav gulên mêrg û çîmenan an jî ji nav lepek axê lê bigere. Ez hê stranbêj im. Ez hê ji xwezayê û ji xewna di navbera şevê û rojê de wendakirî distrim. Ez ê berê xwe bidim deryayê.

Bi wî awayî keştiya wî giha qerax û bendergehê û carek din jî ew di nav gelê xwe de li ser piyan bû. Qîrînek mezin ji dilên wan radibû û bêkesiya veqera li şûnwaran di wî de dilerizî.

Her kes bêdeng bû û li hêviya peyva wî bû lê wî tişteke negot çimkî xemgîniya bîranînê di wî de bû û wî di dilê xwe de digot: Ma min gotiye ku ez ê bistrim? Na, ez ê nestrim, ez ê tenê lêvên xwe ji hev vebikim daku dengê jiyanê derbikeve, bi ba re belav bibe û bibe kêfxweş û bisteyîdan.

Paşî Kerîma, ya ku di dema zaroktiya xwe de li nav bexçeyê diya wî pê re lîstik kiribûn, peyivî: Diwanzdeh salan te rûyê xwe li me veşartiye û diwanzdeh salan em tî û birçiyên dengê te bûne.

Wî bi dilek tijî diltenikiyek bêsinor li wê nerî çimkî ew Kerîma bû ya ku çavên dayika wî danîn ser hev dema ku baskên spî yên mirinê hatin vê bibin. Wî got: Diwanzdeh salan? Te got diwanzdeh salan, Kerîma? Min stêr wek pîva bêrîkirina xwe nexebitandin û kûratiya bêrîkirinê jî bi wan ranegihand çimkî di hesta xerîbiyê û bêrîkirina welat de evîn di ser hemû pîvan û dengên demê re ye.

Hin bîsk hene ku tijî veqetîna ji hev in. Lê dîsan jî veqetîna ji hev ji bilî westîn û kerrixîna dil ne tişteke e. Dibe ku jixwe em qet ji hev veneqetîbin jî.

Almustafa li mirovan nerî û ew hemû dîtin, yên pîr û ciwan, nazik û qelew, ên li ber ba û rojê qelî û qijqijî û yên rûyên wan spîçolkî; û pîrs û bêrîkirin li ser rûyên wan bûn.

Yek ji wan peyivî û got: Mamoste, jiyane nehiştiye ku hevî û daxwazên me bi cî bîn. Dilên me xemgirtî ne û em fam nakin. Ji te lava dikim: xemên me vebirevîne û mebesta xemgîniya me ji me re diyar bike. Dilê wî tijî heyf û berketin bû û wî got: Jiyane ji her tiştê jîndar kevnartir e; mîna ku çawa bedewî bû xwedîbask ji berî ku ti tiştê bedew li ser rûyê erdê çêbûbû û mîna ku çawa rastî rastî ye ji ber ku ew hatibe bilêvkirin jî.

Jiyane di bédengiya me de distre û di bînedana me de xewn û xeyalan dike. Jiyane li ser textê xwe yê bilind e. Dema em digirîn, Jiyane li rojê dibişire û dema em nîr û zincîran li pey xwe radikişînin, Jiyane azad e. Pirrî caran em navên tal li Jiyane dikin lê tenê dema em bi xwe tal û reşbîn bin. Em gazin û lomeyan dikin ku Jiyane vala û bêxêr e lê tenê hingê ku giyanên me li çolistanên xalî bêser digere û dil jî ji xwe bi xwe tijî û mişt e.

Jiyane berz, kûr û dûr e; û tevî ku tenê dilê fire dikare xwe bigihîne tenê binê piyên wê, ew dîsan jî nêz e; û tevî ku tenê nefeskişandina canê te dikare xwe bigihîne dilê wê, siya te rûyê wê diniximîne û qelstirîn banga te jî di bersînga wê de dibe bihar û payiz.

Evîn jî mîna eziya te ya gewretir hatiye niximandin û veşartin. Lê dîsan jî dema Jiyane dipeyive, hemû ba dibin peyv; û dema ew dîsan dipeyive, bişir û rondik li ser lêvên te jî dibin peyv û bêje. Dema Jiyane distre, kerr dibihîzin û kêfxweş dibin û dema ew bi piyan dimeşe, kor wê dibînin û diheyirin û matmayî û ecêbgirtî didin pey wê.

Zû wî ew li wir hiştin û ket ser wê rêkê ya ku diçû nav Bexçe- bexçeyê dayik û bavê wî ku ew bi bavkalên xwe rê lê di xewa abadînê de bûn. Hin kes hebûn ku dixwestin li pey wî biçin deam wan dît ku ew vegera malê bû lê ew bi tenê bû çimkî kesek ji binemala wî nemabû ku li gor adet û toreya gelê wî nûçeya hatina wî di nav xelkê de belav bike.

Lê kaptanê keştiyê ew şîret kirin û gotê: Bihêlin ku ew bi rêya xwe de bimeşe çimkî xwarina wî nanê bêkesiyê û vexwarina wî jî meya bîranînê ye ku dixwaze di tenêtiyê de vebixwe.

Deryavan êdî hew li pey wî çûn çimkî wan dizanî ku kaptan rast dibêje. Hemû kes, ên ku li ber avê civîbûn, jî sekinîn û li pey wî neçûn.

Tenê Kerîma bi dû wî de kêlîkekê çû û hest bi û hest bi bêkesî, tenêti û bîranînên wî kir. Lê ew qet nepeyivî, li ser milê xwe zivirî, çû mala xwe û li nav bexçeyê xwe, li jêr dara behîvê girî lê bê ku bizane çima.

Almustafa hat, bexçeyê diya xwe û bavê xwe dît û derî li pey xwe girt daku kesek nikare li dû wî bikeve hundur.

Çil roj û çil şevan ew bi tena serê xwe di wî xanî ve û li nav wî bexçeyî ma û ti kesek hema nehat ber deriyê bexçe jî çimkî ew girtî bû.

Dema ew çil roj û çil şev derbas bûn, Almustafa derî vekir daku xelk bikare bê hundur.

Neh zalam hatin ji bo ku di nav bexçe de bi wî re bin; sê deryavan ji keştiya wî bi xwe, sê ji wan ên ku di ayîngehê ve ayîndarî dikir û sê jî lîstikhevalên wî yên dema zaroktiyê bûn. Ew her neh bûn şagirtên wî. Spêdeyê şagirtên wî li dor wî rûniştin, û di çavên wî re dûrî û bîranîn dixwiyan. Ji şagirtan wî, yê ku wek Hafiz dihat navandin, got:

Mamoste, ji me re basa bajarê Orfaleseyê û wî welatî, yê ku tu diwanzdeh salan lê mayî, bike.

Almustafa bêdeng bû, wî li zinarên dûr û atmosfera bêsinor dinerî û di bêdengiya wî de ceng hebû. Dû re wî got: Heval û hevrêyên min, di ber wî gelî de bikevin ku tijî bawerî lê bê dîn e. Di ber wî gelî de bikevin yê ku qumaşê bi xwe raneçandî li xwe dike, dexl û danê bi xwe nederûyî û nehêrandî dixwe û meya ne ji tirîzirviçîna xwe vedixwe. Di ber wî gelî de bikevin û bila guneyê we bi wî gelî bê yê ku pozbilindan wek gernas û mêrxas disilavîne û pêşwaz dike û qedir û qîmetek mezin dide

dagîrkerên keysperest. Di ber wî gelî de bikevin û wî biheyifînin ê ku di xewa xwe de henek û qerfan bi hezkirin û coşê dike lê bi şiyarbûna xwe re jêdestî wê dibe. Di ber wî gelî de bikevin ê ku ji bilî dema behî û taziyan dengê xwe bilind nake, ji bilî li nav kaviil û xerabeyên xwe pesna xwe nade û ji berî ku serê wî di nav şûr û gelare û qurmê darê de be, serî hilnade. Di ber wî gelî de bikevin ê ku siyasetmedarên wî gur, fîlozofên wî xapîner û hunera wî jî kopîkirin û jibergirtin e. Di ber wî gelî de bikevin ê ku bi zirnelêdanekê bixêrhatinê li desthilatdarek nû dike û bi henekpêkirinê wî dihêle daku dîsan bi zirnelêxistinek din kesek din bîne ciyê wî. Di ber wî gelî de bikevin ê ku dem û dewranan zanayên wî lal kirine û çelengên wî hê di dergûşan û landikan de ne. Di ber wî gelî de bikevin ku hatiye perçe-perçekirin û her perçeyek ji wan xwe wek gelekî dihesibîne.

Yekî ji wan got: Ji me re basa wê yekê bike ka niha çî di dilê te de ye. Wî li peyiver nerî, mîna ku strana stêrê di nav dengê wî de be got: Di xewna te ya berşiyarbûnê de, dema tu bêdeng î û guhdarê nava xwe yî, ramanên te mîna pirtikên berfê dikevin, dipirrin û hema dengên valahiyên te bi bêdengiya spî de radixin.

Ma xewnên te yên berî şiyarbûnê ji bilî ewran, ên ku bi dara esmanî ya di dilê te de ve şitilan didin û dibişkivin, zêdetir çî ne? Û ma ramanên te ji bilî pel û belgan, ên ku ba li deşt û zozanan pelate û belav dike, zêdetir çî ne?

Mîna ku çawa tu li benda aştiyê yî ta ku yên bêşikil di te de teşe bidin, wisan ewr jî şikil digire û ji hev belawela dibe ta ku Destên Pîroz daxwaza wî ya gewr dike heyv, stêr û rojên biçûk ên krîstal û belûr. Paşî Sarkis, ê ku bi nîvî gumanker bû, got: Lê bihar dê bê û hemû berfên xewn û ramanên me dê bihelin û êdî nemînin.

Wî bersiv da: Dema bihar ji nav rez û pelên raketî li xweşviyayiyên xwe

vedigere, berf bi rastî jî dihelin û wek herik dibezin, li çemê gelî digerin daku bibin avrêj ji gul û giyayan re. Wisan berfa dilê te jî dihele dema ku bihara te hatibe û wisan nihînên te wek herik dibezin daku ji gelî li çemê jiyanê bigerin. Çem nihîna te di nav xwe de digire û wê bi xwe re dimeşîne deryaya mezin.

Dema bihar bê, her tişt dê bihele û bibe stran. Stêr, pirtikên gewre yên berfê, ku hêdîka dikevin nav zeviyên mezin, dihelin û dibin herikên stranbêj. Dema roja rûyê Wî hilbikeve raserî qeraxa esmanê berfire, ma çi qalibê qerisî nabe awazên ron û avî? Ê ma kî ji we naxwaze bibe avderê gul û giyayan?

Hê do bû ku hûn di deryaya livbar de dilebitîn û hûn bêqerax û bêgiyan bûn. Paşî ba ango canê jiyanê, perdeya ronahiyê li ber çavan, hûn raçandin. Ê bi awirek berjor hûn li bilindahiyên digerin. Lê derya li pey we hat û strana wê hê jî di we de ye. Ê tevî ku we kok û jêzatiya xwe ji bîr kiriye jî, ew bi abadîna dayikiya xwe diparêze û her û her bangî we dike.

Dema hûn li çolistan û çiyastanan bigerin, kûriya di dilê wê yê hênik de dê hertim li bîra we be. Ê tevî ku pirrî caran hûn nizanin ku bêriya çi dikin jî, bi rastî ew aştî û aramiya mezin û colînok a deryayê ye. Ma dikare ne wiha be? Li nav daristanê, dema baran li ser pelên darên li zinaran diqerise, dema berf dikeve, soz û peyman; dema li gelî celebê xwe dibê avdanê; li nav zeviyên ku robar bi herikên zîvî cil û bergên kesk didin hev; li nav bexçeyan ku xunavên berbangê di esmanan re diteyisin; li nav mêrg û çîmenan dema mija êvarê bi nivî rêkê diniximîne; di van hemûyan de derya bi te re ye, govan û şahida kok û eslê te, xwesteka evîn û hezkirina te.

Dema ew spêdeyekê di nav bexçe de digerîn, jinek hat ber derî, ew jin Kerîma bû ku Almustafa di zaroktiya xwe de mîna xwişka xwe jê hez

dikir. Ew li ber derî bû, bê ku tiştêkî bipirse yan jî derî biqute; wê tenê bi xemgînî û şeydayî li bexçe dinerî.

Almustafa ev şeydayî û xemgînî di çavên wê de dîtî û bi gavên lezgîn zû hat ber dîwarê bexçe û derî ji Kerîmayê re vekir. Kerîma hat nav bexçe û bixêrhatin li wê hat kirin.

Ew peyivî û got: Çima te xwe ji nav me vekişandiye daku em nikarin li ber ronahiya rûyê te bijîn? Bizane ku hemû van salan me ji te hez kiriye û çavên me li rêya te û vegera te ya biewle bûne û me bêriya te kiriye. Niha xelk bi qîrîn û girîn dixwaze li te guhdarî bike û bi te re bipeyive. Ez şandiya wan im û hatime ji te tika û lava dikim ku tu xwe nîşanî wan bidî û awezmendî û aqilmendiya xwe ji wan re bibêjî û yê dilşkestî aş bikî û xemên wan vebirevînî û di bêaqiliya me de me şîret bikî.

Wî li Kerîmayê nerî û got: Eger tu hemû mirovan wek aqilmend nehesibînî, min jî aqilmend nehesibîne. Ez fêkiyek teze me, hê bi darê ve me û hê do bû ku ez kulîlk bûm.

Û nebêje ku ti kesek di nav we de bêaqil e çimkî bi sond em ne bîaqil û ne jî bêaqil in. Em pelên kesk in bi dara jiyanê ve, û jiyan ji hemû aqildariyê gewretir e û bêguman di ser hemû bêaqiliyê re ye jî.

Ma bi rastî jî min xwe ji nav we vekişandiye? Ma hûn nizanin ku ti dûrî nîn e ji bilî wê ya ku giyan nikare di aşop û xeyalan de bigihîne hev? Û dema giyan pirekê di ser wê dûriyê re ava bike, ew dûrî dibe awazek giyanê.

Dûrî, ya ku di navbera te û yê ne-xweşheval de heye, bi rastî jî ji dûriya di navbera te û delalên ber dilê te, yê ku li pişt heft deryayan dijîn, zêdetir e. Çimkî di bîranînê de dûrî û navbeyn nîn in lê di jibîrkinê de kendeke heye ku ne deng û ne jî çavên te dikarin di ser re derbas bibin. Di navbera qeraxên oqyanûsê û gupika bilindtirîn çiya de rêyek nepenî

heye ku divê tu pê ve bimeşî ta ku bibî yek ji zarokên erdê.

Di navbera zanîn û têgihîna te de rêkek nihînê heye ku divê tu bibînê ji bo ku bi mirovan û herwiha bi xwe re jî bibî yek.

Di navbera destê te yê rastê yê dankar û destê te yê çepê yê wergir de dûriyek zêde mezin heye. Tenê bi texmînkirina dan û wergirtina wan tu dikarî wan bigihînê binecî çimkî tenê bi zanîna wê yekê, ku te bi xwe tiştek dan û wergirtinê nîn e, tu dikarî di ser pirê re derbas bibî.

Bi sond, mezintirîn dûrî di navbera xewndîtin û şiyariya te, kirin û xwestina te de ye.

Û hê rêyek din jî heye ku divê tu pê ve bimeşî ta ku bi jiyane re bibî yek. Lê ez ê niha basa wê rêyê nekim çimkî dibînim ku tu ji rêwîtiyê westiyayî.

Paşî ew, Kerîma û her neh şagirtên wî bi rê ve meşî ta ku gihan bazargehê. Ew ji xelkê re, ji heval û cîranên xwe re peyivî û bi kêfxweşî ket çav û dilên wan.

Wî got: Hûn di xewê de mezin dibin û jiyana xwe ya tertişî di xewnên xwe de dijîn çimkî hemû rojên we bi wê yekê derbas dibin ku hûn spasdarên wê yekê ne ku di bédengiya şevê de ji we re hatiye dan. Pirrî caran hûn di dema bînedana xwe de li ser şevê difikirin û jê diaxivin lê di rastiya de şev dema lêgerîn û dîtîna ye.

Roj hêza zanîna dide we û tiliyên we ew qas fêr dike ku bibin helbestvanên hunera wergirtinê; lê tenê şev dikare we bibe nav gencîneya Jiyane.

Roj her tiştê şênber fêrî bêrînkirina ronahiyê dike lê tenê şev wê bilind dike ber stêran.

Bi rastî jî, bédengiya şevê kirasê bûkê radiçîne, darên daristanan û gulên bexçeyan pê diniximîne û dû re cejn û şahiyên luks amade dike û odeya dawet û zemawendê radixe; di wê bédengiya pîroz de roja

sibeyê di zikê demê de avis dibe.

Bi wî awayî bi we re ye jî û - bi lêgerînê - hûn ê xwarinê peyda bikin û têr bibin. Û tevî ku şiyarbûna we li berbanga rojê bîranînan ji bîra we bibe jî, kevala xewnan hertim li ber we ye û odeya zemawendê amade ye.

Paşî ew bêdeng bû, yên din jî bêdeng bûn û li benda gotinên wî bûn. Dû re wî got: Hûn bi xwe can in, tevî ku ji bo livîn û meşînê beden in; û mîna gazê, ya ku di tarîtiyê de dişewite, hûn jî pêt û çirûsk in lê bi fanosê ve hatine berbandkirin.

Eger hûn tenê beden bûna, ev peyivîna min, a ku ez niha li pêşberî we dikim, dê tenê valatî bûya mîna ku miriyan bangî miriyan bikira. Lê ne wiha ye. Her tişt, ê ku di we de nemir e, bi şevê û rojê azad e û nikare bê zincîrandin û tewilandin çimkî ev yek vîn û îradeya Yê Herî Berz e. Hûn nefesa wî ne, mîna ba jî ku ew jî nikare bê girtin û berbandkirin. Ez bi xwe jî canek im ji canê wî.

Ew bi meşek lezgîn ji nav wan derket û dîsan vegeerî nav Bexçe.

Sarkis, ê ku bi nîvî gumanker bû, got: Tu ji kirêtiyê çi dibêjî, Mamoste? Tu ti caran basa kirêtiyê nakî.

Almustafa, mîna ku di dengê wî de îşkence hebe, bersiva wî da: Heval, ma zelamek heye bibêje ku tu ne mêvanperwer î eger ew di ber mala te re bibore û dîsan jî deriyê te nequte? Ma kî dê te wek kerr û neguhdar binavîne eger ew bi zimanek biyanî bipeyive ku tu tiştêkî tê negihî? Ma kirêtî ne tiştêkî wisan e ku te ti caran nexwestiye xwe bigihîniyê û bikevî dilê wê? Eger kirêtî tiştêkî din be, ew bi rastî tenê qirşikek di çavên te de yan jî qirêjiyek di guhên te de ye. Ji bilî tirsê giyanî ya li hember bîranînen te bi xwe, tiştêkî wek kirêt nênavîne.

Rojekê, dema ew li ber sîberên kûr ên spîndaran rûniştibûn, yekî ji wan got: Mamoste, ez ji demê ditirsim. Ew bi lezgînî di ber me re dibeze

Û xortaniya me ji me distîne lê ma ew çi li şûna wê dide me?

Wî bersivand: Hin axê bigire kefa destê xwe. Tu tov an belkî jî kurmekî di nav de dibînî? Eger destê te têr berfire û baldirêj bûya, tov dê bikariya bibûya daristan û kurmik jî bibûya komek firîşteyan. Û ji bîr neke ku sal, ên ku tov dikan daristan û kurmikan dikan firîşte, bi xwe ev bîsk in, hemû sal ev bîsk û kêlîk in.

Û ma demsal ji bilî ramanên te yê guherbar çi ne? Bihar di sîngê te de şiyarbûn û havîn jî haydarbûna ji bereketa te ye. Û ma payiz ne di te de ya pirrî pîr e ku stranên dergûşanî ji wê yekê re dinehwirînin ku di te de hê sava ye? Û ez dipirsim: ma zivistan ji bilî xewekê, ya ku xewnên hemû demsalên din mezin kiriye, çi ye?

Paşî Mannus, şagirtê mereqdar û zanînxwaz, li dor xwe nerî û dît ku şênkatiyên hêşîn xwe didin nav darê. Û wî got: Li kimê û parazîtan binere, Mamoste. Tu ji wan çi dibêjî? Ew diz in ku ronahiyê ji zarokên xwedîbawer ên rojê didizin û wî benîştî, yê ku dikeve çeq û pelên wan daran, ji xwe re bi kar tînin.

Almustafa bersiv da: Heval, em hemû kimê û parazît in. Em, ên ku tê dikoşin ku komira torf bikin jiyaneke biriqdar, ne ji wan baştir in ku serekaniya jiyana xwe ji torfê digirin bê ku wê binasin jî.

Ma divê ku dayik ji zaroka/ê xwe re bibêje: ez ê te dîsan bidim daristanê, ya ku dayika te ya mezintir e, çimkî tu min, dilê min û destê min diwestînî? Ma divê stranbêj dev ji strana xwe berbide û bibêjîyê: Vebigere şkefta dengvedanan çimkî dengê te gewriya min dimaşîne? Yan ma divê şivan ji lawirek ciwan re bibêje: Min ti çerîngeh nîn e ku te bibimê loma were serjêkirin û bibe gorî û qurban?

Na, heval, na, bersiva vê yekê hatiye dan ji berî ku ew bê pirsîn jî û ew her tişt bi cî hatiye, mîna xewna te jî hê ji berî ku tu binivî jî.

Bi gor zagonek kevnar û bêdem em hemû ji hev dijîn. Loma bila em bi

dilovanî û mihrevanî bijîn. Di bêkesiyê de, dema me kuçk û argûn tine be ku li ber rûbinin, bila em li hev bigerin.

Heval û birayê min, rêya pert û fire xizm û lêzimên we ye.

Ev şênkatî, yên ku bi daran ve dijîn, di bêdengiya şîrîn a şevê de şîrê erdê dimêjin û erd jî di dema xewên xwe yên nerm de bersîngên rojê dimêje. Ê roj, mîna min û te û hemû heyîyan, hê jî bi serfirazî li cejn şahiya Kurmîr rûniştî ye. Deriyê Kurmîr herdem vekirî ye û sifreya wî herdem hazir e.

Mannus, heval, her heyî herdem ji hemû heyîyan dijî, hemû heyî jî ji baweriyê dijîn, ji baweriyê bêsinor bi merdiya Yê Herî Berz.

Spêdeyekê, dema roj ji ber berbangê hê zerik û spîçolkî bû, ew hemû li nav bexçe dihatin û diçûn, ew li rojhilat û di nêzîkiya rojê, ku hildihat, de bêdeng bûn.

Piştî bîskeke Almustafa bi tiliya xwe nîşan da û got: Aşop û xeyalên we ji tava spêdeyê ya di xunavekê de ne ji rojê bi xwe kêmtir e. Teyisîna jiyanê di giyanên we de jiyan bi xwe ye.

Av ronahiyê diteyisîne çimkî ew û ronahî her yek in, û jiyan jî ji we diteyise çimkî hûn û jiyan yek in.

Dema tarîti li raserî we be, hûn bibêjin: Ev tarîti ronahî ye ku hê negihaye, û tevî ku dijwariyên li ser serê min giran in jî, mîna ku çawa ji zinaran re, wisan ji min re jî dê berbang lê bide.

Ê eger çipa avê bibêje: "Lê di hezar salan de ez carekê xunava berbangê me." Tu jê re bibêje: Ma tu nizanî ku ronahiya hemû salan di te re dibiriqe?

Rojekê li wê heremê bahoz bû. Almustafa û her neh şagirtên xwe çûn hundur, li ber agir rûniştin û bêdeng man.

Paşî şagirtekî got: Ez bi tenê me û simên demê bi giranî li sîngê min didin.

Almustafa rabû ser xwe, di nav şagirtên xwe de li ser piyan rawestî û bi dengê bihêz ê mîna hurmîna bayê zûrok got: Bi tenê! Ma çî ye? Jixwe tu bi tenê hatî û divê tu bi tenê bibî mij jî. Loma qedeha xwe bi tenê û di bêdengiyê de vebixwe. Rojên payizê hin qedehên din dane hin kesên din û ew bi meya şîrîn û ya tal dagirtine, her mîna qedeha te jî.

Qedeha xwe bi tena serê xwe dabigire tevî ku çêj û tama xwîn û ronikên te jê bê û jiyane ji ber diyariya tîntiyê bipesinîn. Çimkî bê tîntî dilê te tenê qeraxek hişkbûyî ya deryayê ye, bê awaz û bê hilketin û daketina avê.

Qedeha xwe bi tenê û bi kêfxweşî vebixwe. Wê bilind bike raserî xwe û li şûna wan, ên ku bi tenê vedixwin, jî ta binê vebixwe.

Carekê ez li civata mirovan digerîm û bi wan re rûniştim ser sifreya cejnê û min bi wan re vexwar; lê meya wan hilneket serê min û neherikî bersînga min jî. Ew tenê daket piyên min. Awezmendiya min ziwa ma û dilê min girtî û qifilandî bû. Tenê piyên min bi wan re di nav mijê de bûn.

Êdî ez hew li civata mirovan gerîm û min êdî mey li ser sifreya wan venexwar. Loma ez ji te re dibêjim ku ma çî dibe ku simên demê bi giranî li sîngê te bidin? Bes e ku qedeha xemgîniyê bi tenê bê vexwarin; û divê qedeha kêfxweşiyê jî bi tenê bê vexwarin.

Rojekê, dema Fardous, ê ku yunanî bû, li nav bexçe digerî, piyê wî bi kevirê ket û ew qehirî. Ew li xwe zivirî, kevir ji erdê rakir û bi dengê nizm got: "Ax, kevirê mirî yê li ser rêya min." Wî kevir avêt û virand dûr.

Almustafayê bijartî û hezkirî got: Çima tu dibêjî "Ax kevirê mirî"? Tu ew qas di nav vî Bexçeyî de mayî û hê jî nizanî ku tiştek jî li vir ne mirî ye? Her tişt di haydariya rojê û berziya şevê de dijî û dixemile. Tu û kevir her yek in. Tenak guher di lêdan û qutîna dilên we de ye. Dilê te hinekî

bi leztir lê dide, ma ne wisan e, heval? Lê dîsan jî ew ne bi qasî lêdana dilê kevir aram e.

Rîtma wî dikare rîtmek din be lê ez ji te re bibêjim: Eger di te de awazên kûriyê li hev bên û eger tu bilindiyên valahî û fezayê bipîvî, tu dê tenê awazekê bibihîzî û di wê awazê de kevir û stêr, bi hev re, bi dengê bêkêmasî, distrin.

Eger tu di gotinên wê awazê negihî, li benda berbangê nû bimîne. Eger te kevir nifirand çimkî tu di koriya xwe de lê hilingivî, te dê hingê kîn li stêrekê jî bikira eger wisan bibûya ku serê te bi esman biketa. Lê dê rojek bê ku tu dê kevir û stêra berhev bikî mîna ku çawa zarok sosinan ji gelî hildikişînin û tu dê hingê bizanî ku ew kevir û ew stêr jî jîndar in û bînek xweş ji wan tê.

Li roja yekem a hefteyê, dema dengê çengên ayîngehê li guhên wan digerî, yekî ji şagirtan got: Mamoste, em bi guhên xwe dibihîzin ku li vir basa Yezdan tê kirin. Tu ji Xwedê çi dibêjî, û Ew di rastiyê de çi ye? Ew mîna darek ciwan, a ku ji ba û bahozê netirse, li pêşberî wan li ser lingan rawestî û got: Heval û hogirên min, niha bîr bibin dilekî, ku hemû dilên we tê de bin, hezkirinekê, ku di ser hezkirina we hemûyan re be, canekî, ku dorgirê hemû canên we be, dengêkî, ku dengê we tevan be, û bêdengiyek bêdem û ji hemû bêdengiyên we kûrtir.

Niha tê bikoşin bibînin: bedewiyek ji hemû tiştên bedew efsûntir, stranek ji stranên derya û daristanan berfiretir, desthilatdarek li ser textê xwe, yê ku Orionê bi gopalê hukumdar, ku pê ve Stêrên Moxel tenê teyisokên çipên avê ne, li ber piyan e.

Hûn herdem li xwarin û penagehê, li cil û gopalan gerîne; niha li tişteke wisan bigerin ku ne armanca tîrên we ye û ne jî kevireşkefteke e ku we ji elementan biparêze.

Eger gotinên min mîna kevirên hişk bin û hûn tê negihin, dîsan jî

bigerin daku dilên we bişkên û daku pirsas we we bîne nik hezkirin û awezmendiya Yê Herî Berz ku wek Yezdan tê navandin.

Ew hemû bédeng bûn û dilên wan mat mabûn; û Almustafa di ber wan de ket. Wî bi dilgermî li wan nerî û got: Em êdî ji Xwedê hew bipeyivin. Baştir e ku em ji xwedayan, cîranên me, birayên we, ji wan, ên ku li nêzî xanî û zeviyên we digerin, bipeyivin.

Di xeyalên xwe de hûn bi ser ewran dikevin lê dîsan jî hûn wan bilind dihesibînin, hûn di ser deryaya mezin re derbas dibin lê dîsan jî îddîa dikin ku ew rêyek zêde dirêj e. Lê ez ji we re dibêjim ku dema hûn tov diçînin, hûn jê jî bilindtir dibin, û dema hûn bedewiya spêdeyê ji cîranên xwe re dipesinînin, hûn di ser deryayek hê mezintir re derbas dibin.

Hûn zêde caran ji Yezdan ango ji Bêsînortiyê distrin lê di rastiye de hûn stranê nabihîzin. Xwezî we guh bidaya balindeyên stranbêj û pelên daran, ên ku bi xwişîna ba re ji çeqên daran vediqetin. Ji bîr nekin, hevalno, ku ew tenê ji çeqan veqetî distrin!

Dîsan tika ji we dikim ku hûn ji Yezdan, ku Hemûyê we ye, vala nepeyivin. Baştir e ku hûn ji hevdu re bipeyivin, di hevdu bigihin û ji hevdu fam bikin, wek cîran ji cîranan, wek xweda ji xwedayan re bipeyivin. Çimkî eger mak bifire esmanan, ma kî dê xwarinê bide çûçelokên di hêlînê de? Û ma çima gula anemone dê li nav mêrgê bêkêmasî be eger mêşa hingiv ji anemoneyek din neyê bibe mêrê wê? Tenê eger hûn di eziya xwe ya biçûktir de wenda bûbin, hûn li esmanekî, ku wek Yezdan tê navandin, digerin. Xwezî we rêya ber bi eziya xwe ya mezintir de bidîta; xwezî hûn zîrektir bûna û we rê bihefidandana û binixandana?

Heval û deryavanên min, dê aqildartir bûya ku em kêmtir ji Yezdan, ku em nikarin tê bigihin, biaxivin û zêdetir ji hevdu, ku em dikarin tê

bigihin, bipeyivin. Lê dîsan jî dixwazim hûn bizanin ku em ji can û bîna şêrîn a Yezdan in. Em di pel, di gul û hê pirtir caran jî di kakil û fêkî de Yezdan in.

Spêdeyekê, dema roj bilind bû, yekî ji şagirtan, ji wan sê kesan ên ku di dema zaroktiya xwe de bi wî re lîstik lîstibûn, xwe nêzî wî kir û gotê: Mamoste, cilên min maşîne, dirrîne û perritîne û min ti yên din nîn in. Destûrê bide min ku biçim bazargehê hin bazaran bikim daku ji xwe re destek nû yê cilan peyda bikim.

Almustafa li wî xortî nerî û gotê: Cilên xwe bide dest min. Wî wisan kir û tazî li wê nîvro yê rawestî.

Almustafa bi dengekî, ku dişibî siwariyek li ser rêyê bi çargavî bibeze, got: Tenê yên rûs û tazî li ber tavê dijîn. Tenê yên cahil û sade li ber ba siwar in. Ê tenê ew, ê ku hezar carî ji ser rêya xwe wenda bûbe, dê bigihe malê.

Firîşte bi aqilmendan ve westîne û aciz bûne. Do yekem car firîşteyekî ji min re got: Me dogeh ji bo wan, ên ku dibiriqin, afirand. Ma ji bilî agir çî dikare serrûyê biriqok biruxîne û wî ta naveka wî bihelîne.

Min got: Lê bi afirandina dogehê re we şeytan jî afirandin daku desthilatdariya dogehê bikin. Lê firîşte bersiv da: Na, dogeh di destên wan de ye yên ku jêrdestî agir nabin.

Bi rastî firîşteyek awezmend e! Ew rêyên mirovan û rêyên nîvmirovan baş dinase. Ew yek ji serafan e ku dê xizmeta peyambaran bike dema ku aqilmend wan bixapînin. Ê guman tê de nîn e ku ew ê bi peyambaran re bikene û bigirî.

Heval û deryavanên min, tenê kesên rûs û tazî li ber tava û ronahiya rojê dijîn. Tenê ew, ê ku ji şevê reş e, dê ji berbanga spêdeyê şiyar bibe û tenê ew, ê ku reh û rîşên wî di bin berfê ve dinivin, dê ta biharê bimîne. Çimkî hûn mîna reh û rîşan in, şibî wan sade ne; lê dîsan jî we

aqilmendiya erdê heye. Û hûn bêdeng in lê dîsan jî bi çeqên we yên newelidî ve koroya her çar bayan heye.

Hûn nazik û bêşikil in lê dîsan jî hûn destpêka gûzên girs û mînaka nîv-amade ya darên bî ne. Hûn tenê reh û rîş in di navbera axa reş û esmanê livbar de. Hê carek din jî ji we re dibêjim: Min pirrî caran dîtîye ku hûn radibin reqisîn û govendê lê min herwiha hûn wek şermîn jî dîtine. Hemû reh û rîş şermîn in. Wan ew qas dilên xwe veşartine ku êdî nizanin ka dê bi dilên xwe çi bikin.

Lê gulan dê bê. Û gulan xamayek nêram e: mîna dayikê ew dê bê çavneriyê li û matî ji deşt û zozanan bike.

Yekî ji wan, ê ku di ayîngehê ve îbadet û ayîndarî kiribû, lava jê kir: Mamoste, me fêr bike ku peyvîna me jî bi qasî ya te rastbêj be, ji gel re stran û pêtal be.

Almustafa wiha bersivand: Tu dê bi ser peyvên xwe bikevî lê rêka te dê her wek awaz û bîna xweş bimîne; awaz ji evîndar û evandiyan re û bîna xweş ji wan kesan re ku dixwazin jiyana xwe di nav bexçe de bijîn. Lê tu dê di ser peyvên xwe re bigihî gupika bilindiyê ku mija stêran jê diwere û tu dê destên xwe vebikî ta ku ew tijî bibin; dû re tu dê dabikevî erdê û mîna çûçeloka çivîkek spî, ya ku di hêlînek spî de dinive, rabikevî û mîna gulbinefşên spî, yên ku xewnan ji biharê dibînin, tu dê xewnan ji pêşerojê bibînî.

Belê, tu dê ji peyvên xwe jêrtir dabikevî. Tu dê li çavkaniya wendabûyî ya herikê bigerî û tu şkeftê veşartî yî ku dengên bêhêz ên kûriyê, yên ku tu nabihîzî, jê deng vedidin.

Tu ji peyvan kûrtir dadikevî, belê, ji hemû dangan kûrtir, ta naveka erdê û li wir tu bi Wî re bi tenê yî û Ew bi xwe jî li ser rêya Kadizan dimeşe.

Piştî bîskekê yekî ji şagirtan ji wî pirsî: Mamoste, ji me re basa hebûnê

bike. Hebûn çî ye?

Almustafa demek dirêj li wî nerî û jê hez kir. Ew rabû ser xwe û hinekî ji wan dûr ket; paşî vegeerî û got: Li nav vî Bexçeyî dayika min û bavê min bi destên ên jîndar hatine binaxkirin û li vir ew dinivin. Û tovê sala par, ku bi baskên ba hatine vir, li nav vî bexçeyî, di bin axê ve raketî ne. Divê ez bi hezaran caran dayika xwe û bavê xwe binax bikim û ba jî tov binax bike. Û hezar salan piştî wê yekê - tam mîna îro - em ê bîn nav vî bexçeyî, ez û ev gul, em ê hebin û ji jiyane hez bikin, em ê hebin û ji valahî û fezayan xewnan bibînin û em bi hebûna xwe re ber bi rojê de hilbikevin.

Lê niha hebûn e ku bîaqil bî lê dîsan jî ne ji şetî û dîniyê xerîb bî, bihêz bî lê ne ji bo ruxandina lawazan;

bi zarokan re bilîzî, ne mîna bav lê baştir e ku mîna hevalem lîstinê ku dixwaze lîstika zarokan fêr bibe;

kesek sade û dilpak bî û bi jin û mîrên pîr re li ber sîbera gûzên kevna rûbinî tevî ku tu bi xwe hê bihara jiyana xwe dijî;

li helbestvanekî bigerî tevî ku ew li pişt heft çeman bijî jî û bi wî re aram bî, bê ku tiştekî jê bipirsî, bê ku tiştekî guman bikî, bê ku pirs li ser lêvên te hebin;

bizanî ku ewliya û gunekar biracêmik in ku zarokên Padîşayê Dilovan in û yek ji wan tenê bîskekê ji berî yê din welidî loma yê pêştir dibe Kurmîrê Welîehd;

hingê jî li pey Bedewiyê biçî dema ew te bibe nav kend û kospan jî; û tevî ku wê bask hene û tu bêbask î jî û tevî ku ew li aliyê din jî yê kendê bimeşe, li pey wê here çimkî ciyê bedewî lê tine be, li wir tiştek nîn e;

bexçeyek bê dîwar, rezek bê zêreva, gencîneyek hertim ji wan kesan, ên ku di ber re derbas dibin, re vekirî bî;

şelandî û xapandî bî, belê, rêlêwendakirî, bi ser xefik û davan de avêtî
û dû re henekpêkirî lê dîsan tevî vê hemû yekê jî ji bilindiya eziya xwe
ya girstir li jêr binerî, bibişirî û bizanî ku bihar dê bê nav bexçeyê te
daku li ser pelên darên te bireqise û payiz jî dê bê daku fêkiyê te
bigihîjîne; bizanî ku eger tenê pencereyek te jî ber bi Rojhilat de vekirî
be, tu dê ti caran vala û xalî nebî; bizanî ku hemû kes, yên wek
xerabîkar, xapîner û şelîner hatine navandin, birayên te ne ku ji ber
bêçaretiya xwe wisan dikin û bizanî ku belkî tu bi xwe jî li ber çavên
rûniştvanên pîroz ên Bajarê Nebîn, ê ku di ser vî bajarî re ye, kesek
mîna wan bî.

Û niha, ji we re jî yên ku her tiştê ji şev û rojên me re pêwîst diafirînin
û dibînin -

Hebûn ew e ku bi tiliyên bînbar (ên ku tîn/bên dîtin) tişt bîn raçandin,
avaker e, ew in ku çavnerî li ronahiyê û cî bikin û matî ji wan dikin;
tovçîn bin û hest bi wê yekê bikin û nêçîrvan bin û di ber masî û
dirindeyên daristanê de bikevin lê dîsan jî ji birç û tînetiya mirovan
kêmtir.

Û ji her tiştê zêdetir ez vê yekê dibêjim: Xwezî hûn hemû di têkoşanên
hevdu de beşdar bûna çimkî tenê bi wî awayî hûn dikarin mebestên
xwe yên rind bi cî bînin.

Heval û delalên min, ne lawaz û bizdok lê biste û wêrek bin; ne
bînteng lê bînfire bin; ta ku bîska min a dawîn, mîna ya we bi xwe jî, ji
we mezintir e.

Ew êdî hew peyivî û reşbîniyek kûr her neh şagirtên wî girtin û dilên
wan rûyê xwe ji wî girt çimkî ji gotinên wî fam nedikir.

Û binere, wan her sêyan, ên ku deryavan bûn, bêriya deryayê dikir;
wan, ên ku ayîndarî di Ayîngehê ve kiribû, bêriya xemrevandina
pîrozgehê dikirin; wan, ên ku di dema zaroktiya wî de hevalên wî yên

lîstiklîstinê bûn, bêriya bazargehê dikir.

Ew hemû li hember gotinên wî kerr bûn loma awaza wan gotinan vedigerî nik wî, mîna balindeyên westî û bêhêlîn ku li penagehekê digerin.

Almustafa ji cem wan dûr ket bê ku tiştekî bibêje yan jî li wan binere.

Ew ji xwe re ponijîn û li sedema bêrîkirina xwe fikirîn.

Û binere, ew li xwe zivirîn û her yek ji wan bi aliyê xwe de çû û

Almustafayê bijartî û hezkirî bi tenê ma.

Dema bû nîva şevê, wî gavên xwe ber bi gorra dayika xwe de avêtin û li jêr darek selwiyê rûnişt.

Sîberek mezin a ronahiyê ket esmanan, û dar, mîna ku di hemêza erdê de cewerek rasteqîne û heqîqî be, dibiriqî.

Almustafa di bêkesî û tenêtiya canê xwe de girî û got: Giran e giyanê min ji fêkiyê xwe bi xwe yê gihîştî. Kî dê bê, bixwe û pê têr bibe? Ma kesek tenak jî nîn e ku ta niha rojî girtibe, dilnêrm û dilovan be, bê û rojiya xwe biferitîne û bişkîne, ji berhemê min bixwe û bi wî awayî barê min ji têrtijîtiya min bi xwe bisivikîne?

Giyanê min ji ber meya serdeman radibe û lehiyan dike. Ma kesek nîn e ku bê û jê vebixwe?

Binere, li ber xaçerêyê mêrek hebû ku destên xwe yê tijî durr û cewer ber bi meşvanan de dirêj kiribûn. Wî bangî rêveçûyîyan dikir û digot: Di ber min de bikevin û van ji min werbigirin. Ji bo xatirê Xwedê, ji min werbigirin û xemên min bi wê yekê vebirevînin

Lê meşvanan tenê li wî dinerî û kesekî tiştek ji destê wî nedigirt.

Baştir dibû ku ew gerrokek û parsekek bûya û destê xwe dirêj bikira daku tiştek bixwesta û werbigerta - belê, destê recifok û wî destê xwe dîsan vala vebikişîne paxila xwe ji wê yekê baştir e ku destê xwe yê tijî dewlemendî dirêj bike lê dîsan jî kesek tine be ku jê bigire.

Û binere, kurmîrek merd jî hebû ku konên xwe yên armûşî û hevrîşmî di navbera deşt û zozanan de vedan û daxwaz ji xizmetkarên xwe kir ku agir vêbixin - wek nîşan ji biyanî û gerrokan re - û xulamên xwe şandin daku zêrevaniya rêyan bikin daku mêvanan vebixwînin. Lê rê û borên çolê tema û nemerd bûn û wan kesek tenê jî nedît.

Baştir dibû ku ew kurmîr ne ji ti dem û ti derê bûya, baştir dibû ku ew bi xwe li xwarin û penayê bigeriya. Xwezî ew gerrokek bêmalîyet bûya, ji bilî gopalê xwe û bedena xwe ya dinyayî tiştek tine bûya çimkî hingê, bi hatina şevê re, ew ê pêrgî yên mîna xwe û helbestvanan bihata ku ne ji ti dem û deran in, û wî dê jiyana xwe ya parsekî, bîranîn û xeyalên wan bi wan re parve bikirana.

Binere, keça mîrek mezin ji xewê şiyar bû û cilên xwe yên armûşî û durr û pagendên xwe li xwe kirin, misk li pirça xwe kir û tiliyên xwe di emberê de şil kirin. Paşî ew ji barûya xwe daket, ji nav bexçe li evîne digerrî lê li hemû mîrnişîna mezin a bavê wê kesek tine bû ku evîndarê wê bûya.

Xwezî ew keça cotkarekî bûya, mî li çerîngehê biçerandana û êvarê, axa rêkên zivirrok bi piyên wê ve, bîna rez bi cilên wê ve, ew vebigeriya malê. Û dema şev bihata û firîştayê şevê li ser rûyê erdê bûya, wê bi dizîkî xwe bixîfanda ber çemê gelî ku evîndarê wê li wir li bendê bûya. Xwezî ew li xewlexaneyekê rebene û rehîbe bûya û dilê xwe bişewitanda û bikira pîso daku ew hilbiketa ber ba û canê xwe ango çira biwestanda û bikira ronahiyek ber bi ronahiyek hê mezintir de, bi hemû wan kesan re ku dievînin û tînen evandin.

Xwezî ew jinek pirrî pîr bûya, li ber tavê rûbinişta û bi bîr bianiya ka ciwaniya xwe bi kê re derbas kiribû.

Şev kûr bûbû. Şevê Almustafa tarî kiribû û nefesa wî mîna ewrek xort bû. Û ew dîsan girî:

Giran e giyanê min ji fêkiyê xwe.

Kî dixwaze niha bê, bixwe û

pê têr bibe?

Giyanê min ji meya xwe lehiyan dike.

Kî dixwaze niha bixe, jê vebixwe û

ji germiya çolê azad bibe?

Xwezî ez darek bûma,

bêçilû û bêfêkî,

Çimkî jana têrtijîtiyê ji bêberiyê

biazartir e.

Û xemgîniya yê dewlemend,

ku kes naxwaze jê bigire,

Mezintir e ji jana yê parsek,

ku kes naxwaze tişteki bidiyê.

Xwezî ez bîrek bûma, çikî û vala

ku mirov keviran diavêjinê

Çimkî welidîn asantir û baştir e ji wê yekê

ku kaniya ava jîndaran bûma

Dema mirov di ber re diborin û jê venaxwin.

Xwezî ez qamîş bûma,

di bin piyan ve daşkestî bûma

Çimkî ew asantir e ji wê yekê

ku sazek têlzêrîn bûma

Li malekê ku xwediyê wê bêtilî be

Û zarokên wê kerr bin.

Heft şev û heft rojan kesek tenê jî nehat nêzî Bexçe. Ew bi bîranîn û

janên xwe re bi tenê mabû çimkî ew, ên ku bi hezkirinê û bi baldirêjî li

gotinên wî guhdarî kiribû, jî rûyê xwe ji wî girtibû û berê xwe dabû

pêşerojê.

Tenê Kerîma hat, bêdengiyek mîna perdeyê li ser rûyê wê, fincan û sênîkek di destan de û xwarin û vexwarin anîn bêkesî û birça wî.

Kerîmayê ew danîn ber wî û derket.

Almustafa dîsan çû nik spîndarên li ber deriyê bexçe, rûnişt û li rêyê temaşe kir. Û wî dît ku tişteyê mîna ewrek tozîn li ser rêyê ber bi wî de tê. Ji nav wî ewrî ew neh şagirt û Kerîma jî wek rêbera wan derketin. Almustafa ber bi wan de çû û li ser rêyê pêrgî wan hat. Ew di deriyê bexçe re ketin hundur û rewş baş dixwiya - mîna ku tenê saetekê ew ji cem wî çûbin.

Ew hatin hundur û, piştî ku Kerîmayê nan, masî û meya mayî xist qedehan, wan li ser wê sifreya bêserûber bi nefsbîçûkî xwar. Dema Kerîmayê mey xist qedehan, ji Mamoste lava kir: Destûrê bide ku biçim bazarê hê meyê bînim çimkî ev xelas bûye.

Wî li Kerîmayê nerî û di çavên wî de hesta rêwîtiyê û welatek dûr hebû, wî got: Na, neçe çimkî mey ji bo vê kêlîkê bes e.

Wan xwar û vexwar û têr bûn. Dema wan firavîna xwe qedand, Almustafa bi dengê gewre, bi dengê bi qasî deryayê kûr, bi qasî hilketin û daketina avê li ber heyvê dagirtî, got: Heval û hevrêyên min, divê em îro ji hev vebiqetin. Ji mêj de ye ku em li deryayên firtoneyî û bofîn seyirîne, em bi çiyayên qinc û asê ve hilketine û li hember bahozên pehêt û dijwar me li ber xwe daye. Me birç dîtiye lê em herwiha li nav dawet û dîlanan jî bûne. Pirrî caran em rûs û pêxwas bûne lê me herwiha cilên mîran jî li xwe kirine. Em bi rastî jî dûr çûne lê niha em ê ji hev vebiqetin. Divê hûn bi hev re rêwîtiya xwe bidomînin û ez jî bi tena xwe rêwîtiya xwe bidomînim.

Tevî ku derya û welatên mezin me ji hev vebiqetînin jî, em dîsan jî di rêwîtiya xwe ya ber bi Çiyayê Pîroz de hevrê ne.

Lê ji berî ku her yek ji me bide ser rêya xwe û bi wê ve bimeşe, ez dixwazim berhem û seriyên dilê xwe bidim we:

Bi stranbêjî bi rêya xwe ve bimeşin lê bihêlin ku stranên we kurt bin çimkî tenê ew stran, ên ku zû li ser lêvên we dimirin, di dilê xelkê de jîndar dimînin.

Rastiya şîrîn bi kêm gotinan bibêjin lê rastiya kirêt bi ti awayan nebêjin. Ji keçxanimê, ya ku biskên wê li ber tavê dibiriqin, re bibêjin ku ew keça spêdeyê ye. Lê eger hûn kesek kor bibînin, jê re nebêjin ku ew û şev her yek in.

Mîna ku bilûrvan meha avrêlê be, li wî guhdarî bikin lê eger hûn dengê kesek pitepitî û yê li şaşî û kêmasiyan digere, bibihîzin, mîna hestiyên xwe kerr û mîna aşop û xeyalên xwe jê dûr bin.

Heval û hogirên delal, hûn ê li ser rêya xwe pêrgî kesên pîqalibdayî bîn; baskên xwe bidin wan. Hûn ê mirovên bisim bibînin; destikên defneyan bidin wan. Hûn ê kesên zirne di destan de bibînin; pelên gul û daran bidin wan daku ji xwe re bikin tilî. Û hûn ê rastî mirovên xwedî zimanên tûj bîn; hingiv bidinê daku ji xwe re bikin peyv û gotin.

Belê, hûn ê wan û gelek ên din bibînin; hûn ê bibînin ku linger û seqet gopal û gulteyan û kor jî neynik û awêneyan difiroşin. Hûn ê bibîbin ku mirovên dewlemend li ber deriyên ayîngehan parsekî û xwestokiyê dikan.

Ji bezayiya xwe hinekî bidin lingeran û ji bînahiya xwe li koran bibexişînin; û ji bîr nekin ku divê hûn ji xwe bi xwe tişteki bidin parsekên dewlemend; ji hemûyan zêdetir ew bêçare ne çimkî bi sond ti kesek destê xwe ji bo xêr û sedeqeyan dirêj nake eger ew bi rastî jî ne jar û belengaz be tevî ku ew xwediyê gelekî be jî.

Dost û hevalên min, ji we hêvî dikim ku hûn di evîna xwe de bêhejmar rê û rêbaz bin ku li çolistanê, li wî cî, yê ku hem şêr û kîroşk û hem jî

mî û gur pê ve dimeşin, di ser hev re derbas bibin.

Bila ev gotina min li bîra we be: ez ne danê lê wergirtinê, ne redkirinê lê têrbûnê, ne sertewandinê lê têgihana bi kêfxweşî fêrî we bikim. Ez ne we fêrî bêdengiyê lê strana bêdengiyê bikim. Ez eziya we ya mezintir, ku hemû mirov tê de hene, fêrî we dikim.

Ew ji ser sifreyê rabû û rasterast çû nav bexçe. Dema roj ava dibû, ew li ber sîbera spîndaran digerî. Wan dida pey wî - kêlîkekê li dû wî - çimkî dilê wan giran bû û zimanê wan di devê wan de ziwa dibû.

Tenê Kerîma, piştî ku bermayiyên xwarinê ji ser sifreyê vedan û rakirin, hat cem wî û got: Mamoste, dixwazim tu destûrê bidî min ku ez ji bo sibê û ji bo rêwîtiya te xwarinekê amade bikim.

Wî li çavên Kerîmayê, yên ku ne ev dinya lê hin dinyayên din didîtin, nerî û gotê: Xwişk û delala min, her tişt amade ye, ji destpêka dem û dewranan ta niha amade ye. Çawa ku xwarin ji bo do û îro amade bû, ew ji bo sibê jî amade ye.

Ez ê biçim lê eger, bê ku rastiyê bînim ziman, biçim, rastî dê li min bigere û min bibîne tevî ku ez li nav bêdengiyên bêdemiyê jî hatibim hûrhûr-, pelate- û belavkirin û dîsan jî ez ê bêm pêşberî we daku bi dengê dîsanwelidî, ji dilê bêdengiyên bêsînoriyê bipeyivim.

Û eger bedewiyek mabe ku min ji we re ranegihandibe, dîsan dê bangî min bê kirin û ez ê bêm û bi navê xwe, Almustafa, nîşanê bidim we daku hûn bizanin ku ez vegeirîme ji bo ku li ser tiştên mayî ji we re biaxivim çimkî Yezdan nahêle ku Ew ji mirovan bê veşartin û ne jî gotina Wî di kend û kospên herî kûr ên dilê mirov de veşartî û nepenî bimînin.

Ez ê li aliyê din ê mirinê bijîm û

ez ê di guhên we de bistrim

Piştî hingê jî ku deryaya berfire

min vebigerîne
Kûriya bêyom a deryayê.
Ez ê bêm û bêbeden
li ser sifreya we rûbinim
Û ez ê wek canek nepenî
bi we re bêm nav zeviyên we.
Ez ê wek mêvanek nebînbar
bêm ber kuçkê we.
Mirin ji bilî rûpûş û maskeyên me
tişteki naguherîne.
Darvan dê her wek darvan û
kêlvan dê her wek kêlvan bimîne
Û ew, ê ku strana xwe ji ba re got,
dê wê ji gerestêrên livbar re
jî bistre.

Şagirt mîna keviran bêpêjn bûn û di dilên xwe de ji ber gotina wî, "Ez ê biçim." xemgîn bûn. Lê yekî tenê jî destê xwe dirêj nekir ji bo ku Mamoste bisekinîne û yekî jî neda pey şopên gavên wî.
Mamoste ji bexçeyê dayika xwe derket û piyên wî lezgîn û bêdeng bûn; di bîskeke de, mîna pelek ji darê werî li ber bayek tund, ew ji cem wan dûr ketibû. Wan ew wek ronahiyek qels didît ku ber bi bilindiyên de dilivî.

Ew her neh şagirt bi rê ketin û ber bi jêr de meşîn. Lê Kerîma hê li nav wê tarîşevê, ya ku her reştir dibû, ma û dît ku çawa sî û ronahî helîn nav hev û bûn yek. Wê xemgînî û bêkesiya xwe bi gotinên peyamber verevandin: Ez ê biçim lê eger, bê ku rastiyê bînim ziman, biçim, her ew heman rastî dê li min bigere û min bibîne û ez ê dîsan bêm.
Êdî dema çûnê bû.

Ew gihabû ser girikan. Gavên wî ew biribû nav mijê û ew li nav zinaran
û darselwiyên spî yên berşêr û veşartî li ser lingan bû. Ew peyvî û got:
Ax Mij, xwişka min, nefesa spî,
ku ti caran di dev de nebûyî
Ez ê vebigerim cem te, ey nefesa
spî û bêdeng
Ey peyva hê bilêvnekirî.
Ax Mij, xwişka min a bibask mij,
em niha bi hev re ne,
Û em ê bi hev re bin ta rojek din a jiyanê
Ku berbanga wê dê te, wek xunavekê
li nav bexçe
Û min wek zarokê di hemêza
dayikekê de biwelidîne,
Û em ê bi bîr bînin.
Ax Mij, xwişka min, ez ê vebigerim,
Wek dilekî yê
mîna dilê te
Di kûriyên xwe de guhdar e
Wek xwestekê bicoş û bêarmanc
mîna xwesteka te
Wek ramanek hê dernebirî
mîna ramana te jî.
Ax Mij, xwişka min, nexiya diya min
Hê jî ew tovê te xwestî pelate bikim
di destên min de ye
Û lêvên min strana te xwestî bibêjim
di nav xwe re givaştiye;

Û min ji te re ne fêkî û ne jî
dengvedanek bi xwe re aniye
Çimkî destên min kor û lêvên min jî girtî ne.
Ax Mij, xwişka min, min gelekî ji dinyayê
û dinyayê jî gelekî ji min hez kir
Çimkî bişira min li ser lêvên wê û hemû
rondikên wê di çavên min de bûn
Lê kenda bêdengiyê di navbera me de hebû,
wê nexwest pirekê di ser re ava bike
Û min jî nikarî di ser re biçim.
Ax Mij, xwişka min, xwişka min a nemir
Mij,
Min stranên pirrî kevnar ji zarokên xwe
yên biçûk re gotin,
Wan guhdarî kir û sosretiyek
ket ser rûyê wan;
Lê belkî sibê wan êdî stran
ji bîr kiribe,
Û nizanim ka ba dê
wê ji kê re hilbigire.
Û tevî ku ew ne ya min bi xwe jî bû,
ew ket dilê min
Û bîskekê li ser lêvên min ma.
Ax Mij, xwişka min, tevî ku
ev hemû qewimiye jî,
Ez aram im.
Bes e ku ji yên welidî re strîm.
Û tevî ku strîn bi rastî

ne ya min bi xwe bû jî,
Ew dîsan jî berztirîn daxwaza dilê min bû.
Ax Mij, xwişka min, xwişka min Mij,
Niha ez û tu yek in.
Êdî ez ne xwe bi xwe me.
Dîwar herifîne
Û zincîr piçîne;
Ez hildikevim nik te, mij,
Û em ê bi hev re li hindavî deryayê bipirrin
ta rojek din a jiyane
Dema berbanga spêdeyê te
wek xunavan li nav baxan
Û min, wek zarokekî li ber sînga dayikekê
biwelidîne.
Wergerandin ji inglîzî: Husein Muhammed, 2001
**

BEXÇEYÊ VÎŞNE

ÇEXOV

Bexçeyê Vîşne

Ev pirtûk ji swêdî hatiye wergerandin û li ber wergera bi tirkî di çav re derbas bûye.

ÇEXOV

Bexçeyê Vîşne

Piyeseke çar perde

Werger: Firat Cewerî

Weşanên NÛDEM

ÇEXOV

Bexçeyê Vîşne

Piyeseke çar perde
Werger: Firat Cewerî
Weşanên NÛDEM
Weşanên Nûdem: 9
Bexçeyê Vişne
Çapa Yekem: Stockholm 1995
© Weşanên NÛDEM
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Monet Claude
Wergera swêdî: Körsbarstradgarden
Wergera tirkî: Vişne Bahçesi
ISBN: 91-88592-073
Navnîşan:
Termov. 52. 2 tr.
177 75 Jarfalla-Sweden
Tel û Fax: 8-58356468
Weşanên Nûdem: 9
Bexçeyê Vişne
Çapa Yekem: Stockholm 1995
© Weşanên NÛDEM
Pergala berg û rûpelan: NÛDEM
Wêneya bergê: Monet Claude
Wergera swêdî: Körsbarstradgarden
Wergera tirkî: Vişne Bahçesi
ISBN: 91-88592-073
Navnîşan:
Termov. 52. 2 tr.
177 75 Jarfalla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

ANTON ÇEXOV

1860-1904

Anton Pavlovîç Çexov di hivdehê meha yekê, 1860'î de, li bajarê Taganrogê tê dinyayê. Ew li ber destên bavekî dîndar, sert û awirtûj digihê û li dikana wî şagirtiyê dike. Bavê wî yê dîndar, ji bo ku gunehê xwe bi Xwedê bide efukirin û ruhê xwe nêzîkî Xwedê bike, ew Çexovkê biçûk jî nêzîkî dîn dike û wî di riya dîn de perwerde dike. Çexov di salên xwe yê gelek biçûk de bi xwişk û birayên xwe re di koroya dêrê de distirê û ew herweha stranên xwe yê dînî li malê jî dibêjin û bawêşîna buhuştê li giyanê bavê xwe dikin. Lê bavê wan yê Xwedahez, ji bo ku dîndarên baş û mirovên rind û qenc ji wan derkevin, ew pirraniya caran ji berdêla şîretên bi devkî, lêdan û tadeyiya dinyayekê li wan dike. Pedagojiya wê demê li ser wê nêrînê ava bûbû. Li gori salixdana jiyana aristokratên rûsan, mirov di terbiyekirin û perwerdekirina zarokan de pêrgî gelek lêdan û tirs mezinan ya li ser zarokan tê.

Ji arîstokratbûnê wêdetir, digel ku Çexov ji malbateke kole dihat jî, dîsan bavê wî yê dîndar û sert, ew zarokê bi qasî destekî bi tirs û xofeke mezin digihand. Ji ber wê tirs û xofa bavê xwe, wî newêrîbû li malê bi xwişk û birayên xwe re bi hêsanî henek bikira, bikeniya, bileyista. Ew hemû jî li Çexovê biçûk qedexe bûn. Lê dayika Çexov

ANTON ÇEXOV

1860-1904

Anton Pavlovîç Çexov di hivdehê meha yekê, 1860'î de, li bajarê Taganrogê tê dinyayê. Ew li ber destên bavekî dîndar, sert û awirtûj digihê û li dikana wî şagirtiyê dike. Bavê wî yê dîndar, ji bo ku gunehê xwe bi Xwedê bide efukirin û ruhê xwe nêzîkî Xwedê bike, ew

Çexovkê biçûk jî nêzîkî dîn dike û wî di riya dîn de perwerde dike. Çexov di salên xwe yê gelek biçûk de bi xwişk û birayên xwe re di koroya dêrê de distirê û ew herweha stranên xwe yê dînî li malê jî dibêjin û bawêşîna buhuştê li giyanê bavê xwe dikin. Lê bavê wan yê Xwedahez, ji bo ku dîndarên baş û mirovên rind û qenc ji wan derkevin, ew pirraniya caran ji berdêla şîretên bi devkî, lêdan û tadeyiya dinyayekê li wan dike. Pedagojiya wê demê li ser wê nêrînê ava bûbû. Li gori salixdana jiyana aristokratên rûsan, mirov di terbiyekirin û perwerdekirina zarokan de pêrgî gelek lêdan û tirs mezinan ya li ser zarokan tê.

Ji arîstokratbûnê wêdetir, digel ku Çexov ji malbateke kole dihat jî, dîsan bavê wî yê dîndar û sert, ew zarokê bi qasî destekî bi tirs û xofeke mezin digihand. Ji ber wê tirs û xofa bavê xwe, wî newêrîbû li malê bi xwişk û birayên xwe re bi hêsanî henek bikira, bikeniya, bileyista. Ew hemû jî li Çexovê biçûk qedexe bûn. Lê dayika Çexov ya dilşewat, reben û dilovan, berevajiya bavê wî bû; wê hemû jiyana xwe seferberî zarokên xwe kiribû. Lêdana zarokan deyne aliyekî, ger pozê zarokekî wê xwîn bibûya, ew ji ber êşa wan dikete tayê, dil û cegerê wê ji ber êşa zarokên wê dihatin sotin. Carinan gava bavê Çexov li zarokan dixist, diya wî dixwest zarokên xwe biparêze û li hemberî mêrê xwe derkeve, lê ji bo ku ew di nava heval û cîranan de nebin mijara paşgotinîyê, wê pirraniya caran bêdengî dipejirand û ji ber liberketina zarokên xwe, hêsirên xwe di dilê xwe de dibarandin. Ew diya dilovan, ku zarok û neviya koleyê erdan bû, wê ew zulmdariya koledaran ji bîr nekiribû, ew bîranînên tirsê yê zaroktiya xwe ji zarokên xwe re jî behs dikir; Çexovê biçûk û jîr, guhên xwe miç dikirin, bi saetan li diya xwe guhdarî dikir, di awirên wî de li dijderketina koledaran pêl dida.

Digel zulmdariya bavê xwe, dîsan ew zarokekî jîr, bîaqil û bi terbiye bû. Bavê wî jî armanca disiplîna xwe weha tanî ziman: "Ez dixwazim zarokên min şiyar, jîr û bîaqil bin". Ev yeka han xwesteka hemû bavan e, lê her bav li gorî kultur û têgihîştina xwe zarokên xwe digihînin û wan perwerde dikin. Bavê Çexov jî dixwest zarokên wî qenc bin, zana bin, dewlemend bin. Loma wî tavi lê Çexov şande dibistana Yunaniyan. Wê demê li Rûsyayê gelek arîstokrat û dewlemendên Yunanî hebûn. Pirraniya rûsan jî dixwestin zarokên wan hînî yunanî bibin û wek yunaniyan dewlemend bibin. Lê, li dibistana yunaniyan jî rîya perwerdekirinê di lêxistinê re derbas dibû.

Wî Çexovê biçûk, nazik û hêviya pêşeroja rûsan, ji ber lêdana mamosteyên dibistanê nake der, bi rîza dê û bavê xwe, dev ji dibistana yunaniyan berdide. Lê ji aliyekî ve jiyana bê xwendin çi ye? Kî bê xwendin gihîştîye ku? Kîjan civatê bê xwendin û nivîsandin zincîrên koletiyê şikandiye û gihîştîye azadî û serbestiya xwe? Bavê Çexov jî ya dilşewat, reben û dilovan, berevajîya bavê wî bû; wê hemû jiyana xwe seferberî zarokên xwe kiribû. Lêdana zarokan deyne aliyekî, ger pozê zarokekî wê xwîn bibûya, ew ji ber êşa wan dikete tayê, dil û cegerê wê ji ber êşa zarokên wê dihatin sotin. Carinan gava bavê Çexov li zarokan dixist, diya wî dixwest zarokên xwe biparêze û li hemberî mêrê xwe derkeve, lê ji bo ku ew di nava heval û cîranan de nebin mijara paşgotinîyê, wê pirraniya caran bêdengî dipejirand û ji ber liberketina zarokên xwe, hêsirên xwe di dilê xwe de dibarandin. Ew diya dilovan, ku zarok û neviya koleyê erdan bû, wê ew zulmdariya koledaran ji bîr nekiribû, ew bîranînên tirsê yê zaroktiya xwe ji zarokên xwe re jî behs dikir; Çexovê biçûk û jîr, guhên xwe miç dikirin, bi saetan li diya xwe guhdarî dikir, di awirên wî de

li dijderketina koledaran pêl dida.

Digel zulmdariya bavê xwe, dîsan ew zarokekî jîr, bîaqil û bi terbiye bû. Bavê wî jî armanca disiplîna xwe weha tanî ziman: "Ez dixwazim zarokên min şiyar, jîr û bîaqil bin". Ev yeka han xwesteka

hemû bavan e, lê her bav li gorî kultur û têgihîştina xwe zarokên xwe digihînin û wan perwerde dikin. Bavê Çexov jî dixwest zarokên wî qenc bin, zana bin, dewlemend bin. Loma wî tavi lê Çexov şande dibistana Yunaniyan. Wê demê li Rûsyayê gelek arîstokrat û dewlemendên Yunanî hebûn. Pirraniya rûsan jî dixwestin zarokên wan hînî yunanî bibin û wek yunaniyan dewlemend bibin. Lê, li dibistana yunaniyan jî riya perwerdekirinê di lêxistinê re derbas dibû.

Wî Çexovê biçûk, nazik û hêviya pêşeroja rûsan, ji ber lêdana mamosteyên

dibistanê nake der, bi riza dê û bavê xwe, dev ji dibistana

yunaniyan berdide. Lê ji aliyekî ve jiyana bê xwendin çi ye? Kî bê xwendin gihîştîye ku? Kîjan civatê bê xwendin û nivîsandin zincîrên

koletiyê şikandiye û gihîştîye azadî û serbestiya xwe? Bavê Çexov jî di wê baweriyê de bû. Herçiqas Çexov nazik, bi terbiye û hurmetgir

bû, ew ji bo serketina xwe jî ewçend bi girr bû. Lê hebe tunebe

ew ê ji ber tesîra lêdana bavê xwe û tesîra lêdana dibistana yunaniyan be, ew di dibistana navîn û lîseyê de ne zêde biserketi bû. Lê

gava ew êdî baş bi firê dikeve, ji cîhana zaroktiyê derbasî jiyana mezintiyê dibe, jîrî û zîrekiya wî jî serî hildide, ew ji bo xwendinê ji

nav şaxan şaxa tîbbê hildibijêre, bi serfirazî xwendina xwe xelas dike û dibe doktorekî ciwan, çeleng û hêvîtijî.

Çexov hê di dema xwe ya dibistanê de dest bi nivîsandinê dike,

çîrokên xwe yê pêkenînê lê bi cidiyetê ve tijî, di kovar û rojnameyên herêma de belav dike û bi wî awayî mesrefa xwe ya dibistanê

derdixe û pereyên ku ji ber dimîne jî ji xwe re pê pirtûkan dikire. Çîrokên Dr. Çexov di demeke pirr kurt de li seranserî Rûsyayê deng dide û di wê sîstema, bi gotina Lenîn, Feodal Emperyalîst de ji teqandina edebiyata Rûsyayê re dibe çirûskek.

Nivîskarên hemdemên Çexov, an jî yek ji kaloyên edebiyata rûsan, Tolstoy, di derheqa Çexov de wilo digot: "Çexov ji wan hindiknivîskaran e ku mirov dixwaze çîrokên wî careke din bixwîne".

Gorkî jî hevçaxê xwe Anton Çexov dipesinand, ew mîna çîroknivîskarekî kedkar, kûr û têgihîşti tanî ziman. Wê ew kûrbûn û têgihîştîbûna wî bala Andre Gidê jî kişandibe, loma ew jî di derheqa Çexov de wilo dibêje: "Ez li tu çîrokên Çexov yên ne balkêş rast nehatime; hemû çîrokên wî balkêş in û yek ji ya din xweştir e. Ji xweşbûn û balkêşiyê jî wêdetir ez heyranê wan im".

Ew çîroknivîskarê balkêş, ku di kurtedemekê de sînorê Rûsyaya mezin gav dike û dibe malê hemû dinyayê, bi nêrîna hin rexnegirên wê demê, wî car caran çîroknivîskarê firansîz Guy de Maupasant jî derbas dikir. Tolstoy di derheqa vê yekê de wilo digot: "Çar nivîsdi wê baweriyê de bû. Herçiqas Çexov nazik, bi terbiye û hurmetgir bû, ew ji bo serketina xwe jî ewçend bi girr bû. Lê hebe tunebe ew ê ji ber tesîra lêdana bavê xwe û tesîra lêdana dibistana yunaniyan be, ew di dibistana navîn û lîseyê de ne zêde biserketi bû. Lê gava ew êdî baş bi firê dikeve, ji cîhana zaroktiyê derbasî jiyana mezintiyê dibe, jîrî û zîrekiya wî jî serî hildide, ew ji bo xwendinê ji nav şaxan şaxa tîbbê hildibijêre, bi serfirazî xwendina xwe xelas dike û dibe doktorekî ciwan, çeleng û hêvîtijî.

Çexov hê di dema xwe ya dibistanê de dest bi nivîsandinê dike, çîrokên xwe yên pêkenînê lê bi cidiyetê ve tijî, di kovar û rojnameyên

herêmê de belav dike û bi wî awayî mesrefa xwe ya dibistanê derdixe û pereyên ku ji ber dimîne jî ji xwe re pê pirtûkan dikire. Çîrokên Dr. Çexov di demeke pirr kurt de li seranserê Rûsyayê deng dide û di wê sîstema, bi gotina Lenîn, Feodal Emperyalîst de ji teqandina edebiyata Rûsyayê re dibe çîrûskek.

Nivîskarên hemdemên Çexov, an jî yek ji kaloyên edebiyata rûsan, Tolstoy, di derheqa Çexov de wilo digot: "Çexov ji wan hindiknivîskaran e ku mirov dixwaze çîrokên wî careke din bixwîne".

Gorkî jî hevçaxê xwe Anton Çexov dipesinand, ew mîna çîroknivîskarekî kedkar, kûr û têgihîsti tanî ziman. Wê ew kûrbûn û têgihîstîbûna wî bala Andre Gidê jî kişandibe, loma ew jî di derheqa Çexov de wilo dibêje: "Ez li tu çîrokên Çexov yê ne balkêş rast nehatime; hemû çîrokên wî balkêş in û yek ji ya din xweştir e. Ji xweşbûn û balkêşiyê jî wêdetir ez heyranê wan im".

Ew çîroknivîskarê balkêş, ku di kurtedemekê de sînorê Rûsyaya mezin gav dike û dibe malê hemû dinyayê, bi nêrîna hin rexnegirên wê demê, wî car caran çîroknivîskarê firansîz Guy de Maupassant jî derbas dikir. Tolstoy di derheqa vê yekê de wilo digot: "Çar nivîskarên firansîzan hene; Stendahl, Balzac, Flaubert û yek jê jî Guy de Maupassant e. Lê Çexov di ser Guy de Maupassant re ye".

Ji ber ku Tolstoyê mezin di derheqa Çexov de wilo fikirîbû, zêde neajotîbû ku ji bo ew Tolstoy fedîkar dernexe, wî cihê xwe yê nemir di nava edebiyata rûsan de çêkiribû. Ew bi qasî nivîskariya xwe doktorekî baş û zîrek bû jî. Wî gelek çîrokên xwe bi şarezabûna operatoran nivîsandine, psîkolojiyeke kûr û şerpezetiya ronakbîr, burokrat û arîstokratên rûsan yê sedsala xwe bi zimanekî basît, bi salixdanên kurt û xurt û bi awayekî pêkenînî aniye ziman. Digel ku

ev sedsalek e di ser çîrokên wî re derbas bûne, dîsan jî çîrokên wî bi qasî misqalekî tişteki ji naverok, ziman û forma xwe wînda nekirine. Ew mîna şeraba her ku kevin dibe, tehma wê ewçend xweştir dibe ne. Çîrokên vî hostayê nemir bi kevinbûna xwe nûdem dibin û ji bo ruhên tî dibin şeraba jiyanê.

Lê belê piyesên wî jî çî bigire bi qasî çîrokên wî navdar û xweş in. Herçiqas ew di siya çîrokan de wînda dibin jî, îro, piştî bi sed salî, li paytextên gelek welatên dinyayê piyesên wî li ser dik û sehneyan e. Wilo xuyaye, heta mirovatî û problemên mirovatiyê hebin wê kurteçîrokên Çexov werin xwendin û piyesên wî werin leyistin.

Bi wergerandina berhema vî hostayî ji aliyê wijdan ve rehetiyek bi min re çêbû, hêvîdar im wê ji aliyê moral jî rehetiyekê bide hevvelatiyên min.

Firat CEWERÎ

karên firansîzan hene; Stendahl, Balzac, Flaubert û yek jê jî Guy de Maupassant e. Lê Çexov di ser Guy de Maupassant re ye".

Ji ber ku Tolstoyê mezin di derheqê Çexov de wîlo fikirîbû, zêde neajotîbû ku ji bo ew Tolstoy fedîkar dernexe, wî cihê xwe yê nemir di nava edebiyata rûsan de çêkiribû. Ew bi qasî nivîskariya xwe doktorekî baş û zîrek bû jî. Wî gelek çîrokên xwe bi şarezabûna operatoran nivîsandine, psîkolojiyê kûr û şerpezetiya ronakbîr, burokrat û arîstokratên rûsan yê sedsala xwe bi zimanekî basît, bi salixdanên kurt û xurt û bi awayekî pêkenînî aniyê ziman. Digel ku ev sedsalek e di ser çîrokên wî re derbas bûne, dîsan jî çîrokên wî bi qasî misqalekî tişteki ji naverok, ziman û forma xwe wînda nekirine. Ew mîna şeraba her ku kevin dibe, tehma wê ewçend xweştir dibe ne. Çîrokên vî hostayê nemir bi kevinbûna xwe nûdem dibin û ji bo ruhên tî dibin şeraba jiyanê.

Lê belê piyesên wî jî çî bigire bi qasî çîrokên wî navdar û xweş in. Herçiqas ew di siya çîrokan de winda dibin jî, îro, piştî bi sed salî, li paytextên gelek welatên dinyayê piyesên wî li ser dik û sehneyan e. Wilo xuyaye, heta mirovatî û problemên mirovatiyê hebin wê kurteçîrokên Çexov werin xwendin û piyesên wî werin leyistin.

Bi wergerandina berhema vî hostayî ji aliyê wijdan ve rehetiyek bi min re çêbû, hêvîdar im wê ji aliyê moral jî rehetiyekê bide hevvelatîyên min.

Firat CEWERÎ

KESÊNTÊDE

LUBAV RANEVSKAYA (Xwediya bexçeyê vîşne).

ANYA (Keça wê ya hivdeh salî).

VARYA (Keçmariya wê).

LEONID GAYEV (Birayê wê yê mezin).

YERMOLAV LOPAHÎN (Tacirek).

PIYOTIR TROFÎMOV (Xwendevanek).

SÎMYONOV-PÎŞÇÎK (Xwedîerde).

ŞARLOTTA (Mamosteyeke jin).

SEMYON YEPÎHODOV (Katibek).

DUNYAŞA (Xizmetkarek).

FÎRS (Xulamekî heştê û heft salî).

YAŞA (Xulamekî ciwan).

RÊWÎ

MIDÛRÊ STASYONÊ

KARMENDÊ POSTEXANÊ

MÊVAN, XULAM

Sehne: Malikxaneya Ranevskaya

KESÊNTÊDE

LUBAV RANEVSKAYA (Xwediya bexçeyê vîşne).

ANYA (Keça wê ya hivdeh salî).

VARYA (Keçmariya wê).

LEONID GAYEV (Birayê wê yê mezin).

YERMOLAV LOPAHÎN (Tacirek).

PIYOTIR TROFÎMOV (Xwendevanek).

SÎMYONOV-PÎŞÇÎK (Xwedîerde).

ŞARLOTTA (Mamosteyeke jin).

SEMYON YEPÎHODOV (Katibek).

DUNYAŞA (Xizmetkarek).

FÎRS (Xulamekî heştê û heft salî).

YAŞA (Xulamekî ciwan).

RÊWÎ

MIDÛRÊ STASYONÊ

KARMENDÊ POSTEXANÊ

MÊVAN, XULAM

Sehne: Malikxaneya Ranevskaya

PERDEYA YEKEMÎN

(Odeyeke ku hê jî jê re dibêjin odeya zarokan.

Deriyekî wê li odeya Anya vedibe. Berbang e, piş-tî kurtedemekê wê roj derkeve. Ji ntehan gulan e, darên vîşneyan gul vedane, lê di hişkesayiya sibehê de bexçe sar e. Pencere girtî ne. Dunyaşa bi mûtnekê, Lopahîn jîpirtûkek di dest de ye û dikevin hundur.)

LOPAHÎN: Pir şukur, trê hat. Saet çend e?

DUNYAŞA. Saet tê dudan. (Mûmê vedimirîne.) Dinya rohnî bû jî.

LOPAHIN: Trên jî têra xwe dereng ma ha! Bi kêmanî du saetan.
(Dibawişke, xwe vedizelîne.) Ya min jî xweş
e bi rastî! Rabe, tenê ji bo tu herî stasyonê pêşiya
wan tê werî van deran, paşê jî li ser qoltixan bi
xew re herî. Cihê şermê ye! Lê ji bo çi te ez şiyar
nekirim?

DUNYAŞA: Min texmîn dikir tu çûyî. (Guhê xwe miç dike.)
Hah! Dengê vê erebeya ku tê divê ya wan be.

LOPAHÎN: (Guhdarî dike): Na; Ew ê alavên xwe bidin hev,
rahêjin baholên xwe. (Kurtebêdengiyek) Kî zane
niha bê Stî Ranevskaya ji ber van pênc salên ku li
derveyî welêt buhurandiye çiqasî hatiye guhertin.
Ew jineke bêhawe xweşik e. Ew jineke wilo qenc,
wilo dilpak e ku. Tê bîra min, gava ez xortekî
panzdeh salî bûm, wê demê, li gund dikaneke ba-
10

PERDEYA YEKEMÎN

(Odeyeke ku hê jî jê re dibêjin odeya zarokan.
Deriyekî wê li odeya Anya vedibe. Berbang e, piş-
tî kurtedemekê wê roj derkeve. Ji ntehan gulan e,
darên vîşneyan gul vedane, lê di hişkesayiya sibehê
de bexçe sar e. Pencere girtî ne. Dunyaşa bi
mûtnekê, Lopahîn jîpirtûkek di dest de ye û dikevin
hundur.)

LOPAHÎN: Pir şukur, trên hat. Saet çend e?

DUNYAŞA. Saet tê dudan. (Mûmê vedimirîne.) Dinya rohnî
bû jî.

LOPAHIN: Trên jî têra xwe dereng ma ha! Bi kêmanî du saetan.

(Dibawişke, xwe vedizelîne.) Ya min jî xweş
e bi rastî! Rabe, tenê ji bo tu herî stasyonê pêşiya
wan tê werî van deran, paşê jî li ser qoltixan bi
xew re herî. Cihê şermê ye! Lê ji bo çi te ez şiyar
nekirim?

DUNYAŞA: Min texmîn dikir tu çûyî. (Guhê xwe miç dike.)

Hah! Dengê vê erebeya ku tê divê ya wan be.

LOPAHÎN: (Guhdarî dike): Na; Ew ê alavên xwe bidin hev,

rahêjin baholên xwe. (Kurtebêdengiyek) Kî zane

niha bê Stî Ranevskaya ji ber van pênc salên ku li

derveyî welêt buhurandiye çiqasî hatiye guhertin.

Ew jineke bêhawe xweşik e. Ew jineke wilo qenc,

wilo dilpak e ku. Tê bîra min, gava ez xortekî

panzdeh salî bûm, wê demê, li gund dikaneke ba-

10

vê min hebû, carekê kulmek li dev û rûyê min xistibû

û ji pozê min xwîn der bûbû. Em wê çaxê li

vir, li hewşê bûn -nayê bîra min bê em ji bo çi hatibûn-bavê

min jî têra xwe vexwaribû. Eynî mîna

ku do bûye, tê ber çavê min. Stiya Ranevskaya wê

çaxê keçikeke ciwan, mîna şitilekê bû, wê ez girtibûm,

ji bo şuştuna rûyê min ez anîbûm vî hundurî;

wê çaxê ev der odeya zarokan bû. "Megirî

gundîkê biçûk" gotibû. "Wê heta roja dawetê rehet

bibe." (Kurtebêdengiyek.) Bavê min gundî bû,

rast e, lê carekê jî li min binere; gomlegekî spî li

min e, potînên qehweyî di lingên min de ne, gotin

di cih de be, ez mîna ordekeke ku di gola qazan

de bim. Ya dewlemendiyê ez dewlemend im, lê tu a rastî bixwazî, digel pîrbûna pereyê min ez dîsan mîna gundiyeke me. (Rûpelên pirtûkê di ser hev re diqulupîne.) Ez her vê pirtûkê dixwînim, lê min gotinek jî jê fêhm nekiriye; ji xwe gava min ev xwend ez di xew re çûm. (Kurtebêdengiyek.)

DUNYAŞA: Kûçik heta sibehê ranezan, wan ê hatina xwediyan xwe hîs kiribin.

LOPAHÎN: Çi bi te hatiye wilo, Dunyaşa?

DUNYAŞA: Destên min dilerizin. Ez dikim bêhiş bikevim.

LOPAHÎN: Tu hinekî zêde xeydokî bûyî. Dunyaşa, derdê te yê eslîn jî ev e. Tu mîna jinên ciwan li xwe dikî, te ev porê xwe jî çawan çêkiriye, hela binêre! Ev tiştên vala ne. Divê mirov cihê xwe bizanibe.

(Yepîhodov bi gurzek gul dikeve hundur. Çakêtek lê ye, cîzneyeke dirêj û nuhcîlakirî ku çîke çîk jê tê di lingan de ye. Gava dikeve hundur, gul ji destên wt dikevin.)

11

vê min hebû, carekê kulmek li dev û rûyê min xistibû û ji pozê min xwîn der bûbû. Em wê çaxê li vir, li hewşê bûn -nayê bîra min bê em ji bo çî hatibûn-bavê min jî têra xwe vexwaribû. Eynî mîna ku do bûye, tê ber çavê min. Stiya Ranevskaya wê çaxê keçikeke ciwan, mîna şitilekê bû, wê ez girtibûm, ji bo şuştuna rûyê min ez anîbûm vî hundurî; wê çaxê ev der odeya zarokan bû. "Megirî gundîkê biçûk" gotibû. "Wê heta roja dawetê rehet

bibe." (Kurtebêdengiyek.) Bavê min gundî bû,
rast e, lê carekê jî li min binere; gomlegekî spî li
min e, potînên qehweyî di lingên min de ne, gotin
di cih de be, ez mîna ordekeke ku di gola qazan
de bim. Ya dewlemendiyê ez dewlemend im, lê tu
a rastî bixwazî, digel pirbûna pereyê min ez dîsan
mîna gundiyekekî me. (Rûpelên pirtûkê di ser hev re
diqulupîne.) Ez her vê pirtûkê dixwînim, lê min
gotinek jî jê fêhm nekiriye; ji xwe gava min ev
xwend ez di xew re çûm. (Kurtebêdengiyek.)

DUNYAŞA: Kûçik heta sibehê ranezan, wan ê hatina xwediyên
xwe hîs kiribin.

LOPAHÎN: Çi bi te hatiye wilo, Dunyaşa?

DUNYAŞA: Destên min dilerizin. Ez dikim bêhiş bikevim.

LOPAHÎN: Tu hinekî zêde xeydokî bûyî. Dunyaşa, derdê te
yê eslîn jî ev e. Tu mîna jinên ciwan li xwe dikî, te
ev porê xwe jî çawan çêkiriye, hela binêre! Ev tiş-
tên vala ne. Divê mirov cihê xwe bizanibe.

(Yepîhodov bi gurzek gul dikeve hundur. Çakêtek
lê ye, cîzneyeke dirêj û nuhcîlakirî ku çîke çîk jê
tê di lingan de ye. Gava dikeve hundur, gul ji destên
wt dikevin.)

11

YEPÎHODOV (Gava gulan ji erdê radike): Ev gul baxçevan
şandine; wê li oda xwarinê bi cih bibin. (Gulan dide
Dunyaşayê.)

LOPAHIN: Ji min re jî hinek kvas bîne.

DUNYAŞA: Ser serê min, mîrza. (Dunyaşa derdikeve.)

YEPÎHODOV: Vê sibehê hişkesayî ye, di binê sifrê re sê derece ye. Hemû darên vîşneyan gul dane. Hiş û aqilê min nagihîje vê av û hewa me. (Axînekê dikişîne.) Qet hişê min nagihîjê. Wekî din av û hewa me şaş maye bê wê çî bike. Bi destûra te be ez dixwazim vê jî bi ser ve zêde bikim, hê berî du rojan min ji xwe re cotek cîzme kiribû, bawer bike, mîrza, çîke çîka wê nayê kişandin. Gelo ez çî donî di van cîzman bidim?

LOPAHÎN: Eman, ji min bi dûr bikeve! Te ez aciz kirim.

YEPÎHODOV: Her roj belayek tê serê min. Lê ez gazinan nakim. Na, ez fêrî vê bûme, ez tenê dibişirim.

(Dunyaşa dikeve sehnê, qedehek kvas dide Lopahîn.)

Ez êdî herim. (Li qoltixekê diqelibe û dikeve.)

De bigire! (Bi tewrekî serfirazî.) Tu dibînî, gotina min efû bike, lê ez di nav qezayên weha de me. Heyret e bi rastî, heyret! (Ji sehnê derdikeve.)

DUNYAŞA: Tu zanî, mîrza Lopahîn, Yepîhodov zewac teklîfî min kir.

LOPAHÎN: Wa!

DUNYAŞA: Ez nizanim bê ez ê çî bikim. Bi rastî ew zilame-
. kî efendî ye, lê carinan gava ew dest bi peyvê dike,
'-bijî ji wî yekî re ku tişteki jê fêhm bike. Gotinên
' wî gelekî bi tenikî, gelekî bi mane ne, lê têgihîştina
wan ne mumkun e. Bi gumana min kêfa min ji wî
12

YEPÎHODOV (Gava gulên ji erdê radike): Ev gul baxçevan şandine; wê li oda xwarinê bi cih bibin. (Gulan dide

Dunyaşayê.)

LOPAHIN: Ji min re jî hinek kvas bîne.

DUNYAŞA: Ser serê min, mîrza. (Dunyaşa derdikeve.)

YEPÎHODOV: Vê sibehê hişkesayî ye, di binê sifrê re sê derece ye. Hemû darên vîşneyan gul dane. Hiş û aqilê min nagihîje vê av û hewa me. (Axînekê dikişîne.) Qet hişê min nagihîjê. Wekî din av û hewa me şaş maye bê wê çî bike. Bi destûra te be ez dixwazim vê jî bi ser ve zêde bikim, hê berî du rojan min ji xwe re cotek cîzme kiribû, bawer bike, mîrza, çîke çîka wê nayê kişandin. Gelo ez çî donî di van cîzman bidim?

LOPAHÎN: Eman, ji min bi dûr bikeve! Te ez aciz kirim.

YEPÎHODOV: Her roj belayek tê serê min. Lê ez gazinan nakim. Na, ez fêrî vê bûme, ez tenê dibişirim.

(Dunyaşa dikeve sehnê, qedehê kvas dide Lopahîn.)

Ez êdî herim. (Li qoltixekê diqelibe û dikeve.)

De bigire! (Bi tewrekî serfirazî.) Tu dibînî, gotina min efû bike, lê ez di nav qezayên weha de me. Heyret e bi rastî, heyret! (Ji sehnê derdikeve.)

DUNYAŞA: Tu zanî, mîrza Lopahîn, Yepîhodov zewac teklîfî min kir.

LOPAHÎN: Wa!

DUNYAŞA: Ez nizanim bê ez ê çî bikim. Bi rastî ew zilame-
. kî efendî ye, lê carinan gava ew dest bi peyvê dike,
'-bijî ji wî yekî re ku tiştekî jê fêhm bike. Gotinên
' wî gelekî bi tenikî, gelekî bi mane ne, lê têgihîştina wan ne mumkun e. Bi gumana min kêfa min ji wî

12

re tê. Ew mîna dêhnan ji min hez dike. Ew zilamê dinyayê yê herî bextireş e -her rojên Xwedê tiştin nexweş bi serê wî de tîn. Ji ber vê yekê navek jî li wî kirine- Bêyom!

LOPAHÎN (Guhdarî dike): Ev e! Ez bawer im ew tîn!

DUNYAŞA: Ew tîn ya! Çi bi min hatiye wilo? Dest û lingên min bûne mîna bûzê.

LOPAHIN: Erê, yên ku tîn ew in, ez ne şaş im. Heydê em herin pêşiya wan. Gelo ew ê min nas bike? Ev pênc sal in ku ez nedîtime.

DUNYAŞA (Di hundurê telaşeke mezin de): Ay, ez ê bêhiş bikevim! Ez ê niha bikevim û ji ser hişê xwe herim!

(Dengê du tirimpêlen ku nêztkî malê dibin tete bihîstin.

Lopahîn û Dunyaşa bi lez derdikevin, sehne vala dimîne. Dengê ji odeya li kêlekê tê. Fîrsê ku bi tirimpêlê çûbû stasyonê pêşiya Stî Ranevskaya, xwe dide ser gopâlê xwe yê ziravik û bi telaş diçe vî serî û wî seriyê sehnê. Çakêtekî modekevin yê erebevanan û şevqakî tarînî li sêrî ye; ew di ber xwe de dipeyive, lê gotinek jî tiştên ku ew dibêje nayê fêhmkirin. Her ku diçe dengê ku ji pişt sehnê tê, nêzîk dibe. Dengê: " Di vir re, em di vir re derbas bin. " Ranevskaya, Anya û Şarlotta jî bi serê benikê bi toqika kûçikê xwe yê biçûk girtiye û dikeve hundur. Li hemûyan jî kincên rêwîtiyê hene; bi manto û şerpeyên xwe Varya, Gayev, Sîmyonov-Pîşçîk,

13

re tê. Ew mîna dêhnan ji min hez dike. Ew zilamê dinyayê yê herî bextireş e -her rojên Xwedê tiştin nexweş bi serê wî de tîn. Ji ber vê yekê navek jî li wî kirine- Bêyom!

LOPAHÎN (Guhdarî dike): Ev e! Ez bawer im ew tîn!

DUNYAŞA: Ew tîn ya! Çi bi min hatiye wilo? Dest û lingên min bûne mîna bûzê.

LOPAHIN: Erê, yên ku tîn ew in, ez ne şaş im. Heydê em herin pêşiya wan. Gelo ew ê min nas bike? Ev pênc sal in ku ez nedîtime.

DUNYAŞA (Di hundurê telaşeke mezin de): Ay, ez ê bêhiş bikevim! Ez ê niha bikevim û ji ser hişê xwe herim!

(Dengê du tirimpêlen ku nêztkî malê dibin tete bihîstin.

Lopahîn û Dunyaşa bi lez derdikevin, sehne vala dimîne. Dengê ji odeya li kêlekê tê. Fîrsê ku bi tirimpêlê çûbû stasyonê pêşiya Stî Ranevskaya, xwe dide ser gopale xwe yê ziravik û bi telaş diçe vî serî û wî seriyê sehnê. Çakêtekî modekevin yê erebevanan û şevqakî tarînî li sêrî ye; ew di ber xwe de dipeyive, lê gotinek jî tiştên ku ew dibêje nayê fêhmkirin. Her ku diçe dengê ku ji pişt sehnê tê, nêzîk dibe. Dengê: " Di vir re, em di vir re derbas bin. " Ranevskaya, Anya û Şarlotta jî bi serê benikê bi toqika kûçikê xwe yê biçûk girtiye û dikeve hundur.

Li hemûyan jî kincên rêwîtiyê hene; bi manto û şerpeyên xwe Varya, Gayev, Sîmyonov-Pîşçîk,

13

Lopahîn, bi pakêtekê, Dunyaşaya ku sîwanek di

dest de, xulamên ku baholên wan hilgirtine; hemû dikevin sehnê.)

ANYA: Di vir re werin. Ev kîjan ode ye, gelo tê bîra te yadê?

RANEVSKAYA (Bi kêf, hêsirji çavan tê): Oda zarokan!

VARYA. Çi sar e, destên min qefilîn. (Ji Ranevskayayê re.)

Odeyên we, odeya spî û ya di rengê leglegê de, eynî mîna ku we hiştibûn e, yadê.

RANEVSKAYA: Odeya zarokan, cana min, odeya xweşik ya zarokan! Gava ez biçûk bûm ez li vir radizam.

(Bi girî.) Binêre, va ye ez dîsan bûme mîna zarokan...

(Gayev û Varyayê, paşê dîsan Gayev maçî

dike.) Varya qet nehatiye guhertin, dîsan wilo, weke

berê, mîna rehîbeyekê ye. Min tavi lê Dunyaşa

jî nas kir. (Dunyaşa maçîdike).

GAYEV: Trêna we du saetan dereng ma. Ji vê re çi tê gotin?

Qaşo di wextê de!

ŞARLOTTA (Sîmyonov ji Pîşçîk re): Kûçikê min nok û findiqan dixwe.

PÎŞÇÎK (Bi heyret). Na cana min!

(Ji bilî Anya û Dunyaşa hemû derdikevin.)

DUNYAŞA: Dawî dawî va ye hûn vegeyriyan! (Radihîje şevqe û mantoyê Anyayê.)

ANYA: Ez di hemû rêwîtiyê de çar şevan ranezam. Min ecêb sar e.

DUNYAŞA: Gava hûn ji vir çûn Perhîza Mezin bû. Berf di-

14

Lopahîn, bi pakêtekê, Dunyaşaya ku sîwanek di

dest de, xulamên ku baholên wan hilgirtine; hemû dikevin sehnê.)

ANYA: Di vir re werin. Ev kîjan ode ye, gelo tê bîra te yadê?

RANEVSKAYA (Bi kêf, hêsirji çavan tê): Oda zarokan!

VARYA. Çi sar e, destên min qefilîn. (Ji Ranevskayayê re.)

Odeyên we, odeya spî û ya di rengê leglegê de, eynî mîna ku we hiştibûn e, yadê.

RANEVSKAYA: Odeya zarokan, cana min, odeya xweşik ya zarokan! Gava ez biçûk bûm ez li vir radizam.

(Bi girî.) Binêre, va ye ez dîsan bûme mîna zarokan...

(Gayev û Varyayê, paşê dîsan Gayev maçî dike.) Varya qet nehatiye guhertin, dîsan wilo, weke berê, mîna rehîbeyekê ye. Min tavilê Dunyaşa jî nas kir. (Dunyaşa maçîdike).

GAYEV: Trêna we du saetan dereng ma. Ji vê re çi tê gotin? Qaşo di wextê de!

ŞARLOTTA (Sîmyonov ji Pîşçîk re): Kûçikê min nok û findiqan dixwe.

PÎŞÇÎK (Bi heyret). Na cana min!

(Ji bilîAnyaya û Dunyaşa hemû derdikevin.)

DUNYAŞA: Dawî dawî va ye hûn vegeyriyan! (Radihîje şevqe û mantoyê Anyayê.)

ANYA: Ez di hemû rêwîtiyê de çar şevan ranezam. Min ecêb sar e.

DUNYAŞA: Gava hûn ji vir çûn Perhîza Mezin bû. Berf di-

14

bariya, hewa jî mîna cemedê bû. Lê belê niha-tu

bala xwe bidê! Cana min! (Dikene û Anyayê maçî 'dike.) Min evqasî bêriya te kiriye ku, gula min, ruhê min! Ha, tiştê heye, divê ez tavilê ji te re behs bikim, ez nikanim deqîqeyekê jî rawestim.

ANYA (Bi tewrekî bê qeyd). Çi ye?

DUNYAŞA: Ev Yepîhodov heye ya, yê katib, hema piştî Hêkesorê bû, wî pêşniyaza zewacê ji min re anî.

ANYA: Dîsan ewê ha. (Porê xwe rast dike.) Min hemû berbiskên xwe winda kirin. (Ji westandinê li ser lingan diheje.)

DUNYAŞA: Weleh ez nizanim bê ez ê çi bikim. Ew ewqasî dildarê min e ku!

ANYA (Bi hezkirin ji odeya xwe li hundur dinêre): Odeka min, pencereyên min, mîna ku ez qet ji vir neçûbim! Va ye ez dîsan li hêlîna xwe me! Gava ez sibehê rabim ez ê xwe bavêjim nava bexçe... Tenê bila ez bikaribim razêm! Ji gava ku em ji Parîsê veqetiyane min ji heyecanê çavên xwe nedane ser hev.

DUNYAŞA: Mîrza Trofîmov do hat.

ANYA (Bi kêf): Petya!

DUNYAŞA: Ew niha li serşokê radizê, li wir bi cih bûye. Wî got, ez rehetiya kesî li wan neşikînim. (Li saeta di destê xwe de dinihêre.) Ez niha herim wî şiyar bikim, lê Stiya Varya got divê şiyar nekim. "Tu tu bî, tu nebêje ez ê wî şiyar bikim." wê ez temî kirim. (Komek mifte di ber piştî Varya de ye û dikeve

bariya, hewa jî mîna cemedê bû. Lê belê niha-tu bala xwe bidê! Cana min! (Dikene û Anyayê maçî 'dike.) Min evqasî bêriya te kiriye ku, gula min, ruhê min! Ha, tişteke heye, divê ez tavilê ji te re behs bikim, ez nikanim deqîqeyekê jî rawestim.

ANYA (Bi tewrekî bê qeyd). Çi ye?

DUNYAŞA: Ev Yepîhodov heye ya, yê katib, hema piştî Hêkesorê bû, wî pêşniyaza zewacê ji min re anî.

ANYA: Dîsan ewê ha. (Porê xwe rast dike.) Min hemû berbiskên xwe winda kirin. (Ji westandinê li ser lingan diheje.)

DUNYAŞA: Weleh ez nizanim bê ez ê çi bikim. Ew ewqasî dildarê min e ku!

ANYA (Bi hezkirin ji odeya xwe li hundur dinêre): Odeka min, pencereyên min, mîna ku ez qet ji vir neçûbim! Va ye ez dîsan li hêlîna xwe me! Gava ez sibehê rabim ez ê xwe bavêjim nava bexçe... Tenê bila ez bikaribim razêm! Ji gava ku em ji Parîsê veqetiyane min ji heyecanê çavên xwe nedane ser hev.

DUNYAŞA: Mîrza Trofîmov do hat.

ANYA (Bi kêf): Petya!

DUNYAŞA: Ew niha li serşokê radizê, li wir bi cih bûye. Wî got, ez rehetiya kesî li wan neşikînim. (Li saeta di destê xwe de dinihêre.) Ez niha herim wî şiyar bikim, lê Stiya Varya got divê şiyar nekim. "Tu tu bî, tu nebêje ez ê wî şiyar bikim." wê ez temî kirim. (Komek mifte di ber piştî Varya de ye û dikeve

15

sehneyê.)

VARYA: Dunyaşa, here qehwê bîne, zû. Diya min qehwê dixwaze.

DUNYAŞA: A niha, taviê! (Derdikeve.)

VARYA: Eh, hûn hatin, mala Xwedê ava. Va ye tu li hêlîna xwe yî. (Nêzîkî Anya dibe, milekî xwe lê digerîne.) Zaroka min vejeriya ye! Xweşika min vejeriya ye!

ANYA: Min çi kişand, çi!

VARYA: Ez ji te bawer dikim.

ANYA: Ez ji vir di Rojiya Mezin de bi rê ketim, tê bîra te, gelekî sar bû; Şarlotta di hemû rêwîtiyê de bê ku raweste peyivî, canbazî nema ku wê nekir. Ma çima te ew kire bela serê min?

VARYA: Canika min, tu bi tenê nikarîbû derketa rêwîtiyê. Hivdeh salî!

ANYA: Gava em gihîştin Parîsê hewa sar bû, berf dibariya.

Fransiya min jî ewqasî xerab bû ku... Diya min li qatê pêncan rûdinişt. Gava ez hilkişiyam jor, li ba wê komêk fransîz hebû, jin û mêr û papazekî katolîk î pirtûkek di dest de, ji bêhna dixanê der û ? dor mehf bûbû. Ax, wilo gunehê min bi diya min

hat ku! Min serê wê danî ser sînga xwe, min nika-
-./? nîbû ew berda. Loma diya min jî dest bi girî kir, ji hêlekê ve ez maçî dikirim û ji hêlekê ve jî digiriya.

VARYA (Bi çavên şil): Çi dibe behs meke, ez debar nakim.

ANYA: Vîlaya xwe ya li Monteneyê firotiye, tiştêk di destên

dayika min de nemaye, yê min jî di bêrîka min de
çerxîyek jî tune. Me bi zorê xwe gihandiye vit

16

sehneyê.)

VARYA: Dunyaşa, here qehwê bîne, zû. Diya min qehwê
dixwaze.

DUNYAŞA: A niha, taviê! (Derdikeve.)

VARYA: Eh, hûn hatin, mala Xwedê ava. Va ye tu li hêlîna
xwe yî. (Nêzîkî Anya dibe, milekî xwe lê digerî-
ne.) Zaroka min vegeyriya ye! Xweşika min vegeyriya
ye!

ANYA: Min çî kişand, çî!

VARYA: Ez ji te bawer dikim.

ANYA: Ez ji vir di Rojiya Mezin de bi rê ketim, tê bîra te,
gelekî sar bû; Şarlotta di hemû rêwîtiyê de bê ku
raweste peyivî, canbazî nema ku wê nekir. Ma çima
te ew kire bela serê min?

VARYA: Canika min, tu bi tenê nikarîbû derketa rêwîtiyê.
Hivdeh salî!

ANYA: Gava em gihîştin Parîsê hewa sar bû, berf dibariya.

Fransiya min jî ewqasî xerab bû ku... Diya min li
qatê pêncan rûdinişt. Gava ez hilkişiyam jor, li ba
wê komêk fransîz hebû, jin û mêr û papazekî katolîk
î pirtûkek di dest de, ji bêhna dixanê der û ? dor mehf bûbû. Ax, wilo
gunehê min bi diya min

hat ku! Min serê wê danî ser sînga xwe, min nika-
-./? nîbû ew berda. Loma diya min jî dest bi girî kir, ji
hêlekê ve ez maçî dikirim û ji hêlekê ve jî digiriya.

VARYA (Bi çavên şil): Çi dibe behs meke, ez debar nakim.

ANYA: Vîlaya xwe ya li Monteneyê firotiyê, tiştêk di destên dayika min de nemaye, yê min jî di bêrîka min de çerxîyek jî tune. Me bi zorê xwe gihandiye vit
16

Lê diya min rewşê fêhm nake! Gava me li restorantan xwarin dixwar, wê xwarinên herî biha dixwest, her garsonêkî jî rubleyek bexşîş dida wan.

Tabî, Şarlotta jî ji wê kêr nedima. Yaşa jî bi me leyist. Yaşa xulamê diya min e, tu dizanî, me ew jî bi xwe re anî.

VARYA: Erê, min ew tolaz dît.

ANYA: Eh, ka niha jî tu ji min re behs bike, we kanîbû faîza îpotekê bidaya?

VARYA: Me ê çawan bida?

ANYA: Heywax! Heywax!

VARYA: Di meha tebaxê de ew ê ji bo firotinê derkeve mazatê.

ANYA: Aman ya Rebî!

LOPAHÎN (Serê xwe di derî re derdixe û mîna çêleka di-ûre). Muu-u. (Vedikişe.)

VARYA (Bi hêsirên çavên xwe kulma xwe ber bi dêrî ve dihejîne):

Ax, min bikarîba yek li serê vî bixista!

ANYA (Varyayê hemêz dike, bi dengê nerm): Varya, ma wî pêşniyaza zewacê ji te re anî? (Varya bi neyînî serê xwe dihejîne.) Lê ew ji te hez dike! Ji bo çi hûn li hev nakin gelo? Tu hê li benda çi yî?

VARYA: Bi min dawiya vî karî tune ye. Di destpêk de karê wî evîna wî ye, wextê ku ew ji min re veqetîne tune

ye - çavên wî jî min nabînin. Xwedê sebir daye
min, an na min ê debar nekira ku ez rûyê wî jî bibînim.
Her kes behs dikin ku em zewicî ne, yê ku
ez pêrgî wan tîm min pîroz dikin, ya rastî tiştêkî
wilo li holê tune ye, mîna xewnekê ye. (Bi tona
dengekî cihê.) Bronşa te ya nû di şiklê mêşa hingiv
17

Lê diya min rewşê fêhm nake! Gava me li restorantan
xwarin dixwar, wê xwarinên herî biha dixwest,
her garsonêkî jî ribleyek bexşîş dida wan.
Tabî, Şarlotta jî ji wê kêr nedima. Yaşa jî bi me
leyist. Yaşa xulamê diya min e, tu dizanî, me ew jî
bi xwe re anî.

VARYA: Erê, min ew tolaz dît.

ANYA: Eh, ka niha jî tu ji min re behs bike, we kanîbû faîza
îpotekê bidaya?

VARYA: Me ê çawan bida?

ANYA: Heywax! Heywax!

VARYA: Di meha tebaxê de ew ê ji bo firotinê derkeve mazatê.

ANYA: Aman ya Rebî!

LOPAHÎN (Serê xwe di derî re derdixe û mîna çêleka di-
ûre). Muu-u. (Vedikişe.)

VARYA (Bi hêsirên çavên xwe kulma xwe ber bi dêrî ve dihejîne):

Ax, min bikarîba yek li serê vî bixista!

ANYA (Varyayê hemêz dike, bi dengekî nerm): Varya, ma
wî pêşniyaza zewacê ji te re anî? (Varya bi neyînî
serê xwe dihejîne.) Lê ew ji te hez dike! Ji bo çi
hûn li hev nakin gelo? Tu hê li benda çi yî?

VARYA: Bi min dawiya vî karî tune ye. Di destpêk de karê wî evîna wî ye, wextê ku ew ji min re veqetîne tune ye - çavên wî jî min nabînin. Xwedê sebir daye min, an na min ê debar nekira ku ez rûyê wî jî bibînim. Her kes behs dikin ku em zewicî ne, yê ku ez pêrgî wan tîm min pîroz dikin, ya rastî tiştêkî wilo li holê tune ye, mîna xewnekê ye. (Bi tona dengêkî cihê.) Bronşa te ya nû di şiklê mêşa hingiv 17 deye.

ANYA (Bi xemgînî): Diya min ji min re kirî ye. (Derbasî odeya xwe dibe, bi kêfû şahî, bi tona dengê zarokane dipeyive.) Ez li Parîsê li nepoxê siwar bûm!

VARYA: Ez bi vegera te çiqasî kêfxweş bûm, canika min! Xweşika min!

(Dunyaşa bi taximê qehwê dikeve hundur, dest pê dike qehwê çêdike.)

VARYA (Li ber derî radiweste): Ez hemû rojê ji aliyekî bi pakkirina malê ve mijûl bûm, ji aliyekî ve jî min xeyal çêkirin, ku me tu bi yekî dewlemend re bizewicanda.

Dê wê çaxê dilê min rehet bibe. Ez ê jî bikarim herim Kîevê û Moskovayê cihên pîroz ziyaret bikim... Ez ê bikanim yek bi yek li hemû cihên pîroz bigerim. Çi bextiyarî ye!

ANYA: Çûk li bexçe dixwînin. Saet bû çend?

VARYA: Ez bawer im dudo derbas dibe. Êdî tu razê berxika min. (Li dû Anyayê dikeve odeya wê.) Çi bextiyarî! (Yaşa bi betaniyekê û bi çenteyekî re dikeve hundur.)

YAŞA (Bi celebekî têlmaşî di sehnê re derbas dibe): Bi destû-
ra we ya bilind be, gelo ez dikarim di vir re derbas
bibim?

DUNYAŞA: Min wextî tu nasnekiriba, Yaşa. Tu çiqasî hatiyêguhertin!
18
deye.

ANYA (Bi xemgînî): Diya min ji min re kirî ye. (Derbasî
odeya xwe dibe, bi kêfû şahî, bi tona dengê zarokane
dipeyive.) Ez li Parîsê li nepoxê siwar bûm!

VARYA: Ez bi vegera te çiqasî kêfxweş bûm, canika min!
Xweşika min!

(Dunyaşa bi taximê qehwê dikeve hundur, dest pê
dike qehwê çêdike.)

VARYA (Li ber derî radiweste): Ez hemû rojê ji aliyekî bi
pakkirina malê ve mijûl bûm, ji aliyekî ve jî min
xeyal çêkirin, ku me tu bi yekî dewlemend re bizewicanda.
Dê wê çaxê dilê min rehet bibe. Ez ê jî
bikarim herim Kîevê û Moskovayê cihên pîroz ziyaret
bikim... Ez ê bikanim yek bi yek li hemû cihên
pîroz bigerim. Çi bextiyarî ye!

ANYA: Çûk li bexçe dixwînin. Saet bû çend?

VARYA: Ez bawer im dudo derbas dibe. Êdî tu razê berxika
min. (Li dû Anyayê dikeve odeya wê.) Çi bextiyarî!

(Yaşa bi betaniyekê û bi çenteyekî re dikeve hundur.)

YAŞA (Bi celebekî têlmaşî di sehnê re derbas dibe): Bi destû-
ra we ya bilind be, gelo ez dikarim di vir re derbas
bibim?

DUNYAŞA: Min wextî tu nasnekiriba, Yaşa. Tu çiqasî hatiyêguhertin!

18

YAŞA: Oho, gelo ez bi kê re serbilind dibim?

DUNYAŞA: Gava tu ji vir çû ez biçûk bûm -a ez evqas bûm-. (Bi destê xwe ji erdê bilindahiyeye xuyayî nîşan dide.) Ez Dunyaşa me, keça Fedor Kozoyedov. Ez ê ji ku werime bîra te!

YAŞA: Hoo, çi perçe ye! (Bi îhtiyadî li dora xwe dinihêre, paşê Dunyaşayê hemêz dike; Dunyaşa diqîre û tepsîka di destê xwe de dixîne. Yaşa bi lez derdikeve.)

VARYA (Di devê derîde bi sertî): Çi bûye gelo?

DUNYAŞA (Digirî). Min binikekê fîncanekê şikandiye.

VARYA: Xem nake, xêr e.

(Anya ji odeya xwe derdikeve sehnê.)

ANYA: Divê em ji diya min re bibêjin ku Petya li vir e.

VARYA: Min ew temî kiribûn ku ew wê şiyar nekin.

ANYA (Mîna ku difikire): Ev tam şeş salên bavê min e ku miriye. Hê deh roj di ser mirina wî re derbas bûbû Grîşa di çêm de fetisî - xwişka min a reben, hê neketibû heftsaliya xwe. Diya min jî nikanîbû ev hemû debar bikira, ji bo ku ew hemû derdên xwe ji bîr bike, ew ji vir çû. (Dilerize.) Bila dayika min zanîba bê ez çiqasî wê fêhm dikim! (Kurtebêdengiyek.)Wê niha Petya Trofimov di bîra diya min de bîne. Ew mamosteyê Grîşa bû.

(Fîrs bi êlegekî spî û paltoyekî dirêj ve dikeve sehneyê.)

19

YAŞA: Oho, gelo ez bi kê re serbilind dibim?

DUNYAŞA: Gava tu ji vir çû ez biçûk bûm -a ez evqas

bûm-. (Bi destê xwe ji erdê bilindahiyê xuyayî nîşan dide.) Ez Dunyaşa me, keça Fedor Kozoyedov. Ez ê ji ku werime bîra te!

YAŞA: Hoo, çi perçe ye! (Bi îhtiyadî li dora xwe dinihêre, paşê Dunyaşayê hemêz dike; Dunyaşa diqîre û tepsîka di destê xwe de dixîne. Yaşa bi lez derdikeve.)

VARYA (Di devê derîde bi sertî): Çi bûye gelo?

DUNYAŞA (Digirî). Min binikekî fîncanekê şikandiye.

VARYA: Xem nake, xêr e.

(Anya ji odeya xwe derdikeve sehnê.)

ANYA: Divê em ji diya min re bibêjin ku Petya li vir e.

VARYA: Min ew temî kiribûn ku ew wê şiyar nekin.

ANYA (Mîna ku difikire): Ev tam şeş salên bavê min e ku miriye. Hê deh roj di ser mirina wî re derbas bûbû

Grîşa di çêm de fetisî - xwişka min a reben, hê neketibû

heftsaliya xwe. Diya min jî nikanîbû ev hemû

debar bikira, ji bo ku ew hemû derdên xwe ji

bîr bike, ew ji vir çû. (Dilerize.) Bila dayika min

zanîba bê ez çiqasî wê fêhm dikim! (Kurtebêdengiyek.) Wê

niha Petya Trofimov di bîra diya min

de bîne. Ew mamosteyê Grîşa bû.

(Fîrs bi êlegekî spî û paltoyekî dirêj ve dikeve sehneyê.)

19

FÎRS (Bi mereq ber bi taximên qehwê ve diçe): Wê xanim

qehweyên xwe li vir vexwin. (Lepikên xwe yên spî

dixe destên xwe.) Qehwe hazir e? (Bi sertî ji

Dunyaşayê re.) Kanî kremaya vê keçê?

DUNYAŞA: Heywax! (Bi şaşmayîji sehnê derdikeve.)

FÎRS (Bi rêk û pêkbûneke nepêwîst di telaşa rastkirina taximê qehwê de ye): Hih! Bêkêr, tu jî! (Di ber xwe de dipeyive.) Ev e xanima min ji Parîsê vegeriyaye. Wê begê min jî biçûya Parîsê, wê çaxê - hem, li hemû menzîlan hespan diguhere. (Dikene.)

VARYA. Xêr e, Fîrs?

FÎRS. Ezbenî? (Bi dilşahî.) Xanima min vegeriyaye hêlîna xwe! Min bi çavên xwe careke din ew dît ya! Ez êdî çawekirî naçim gorê. (Hêsirên dilşahiyê dirijîne.)

(Ranevskaya, Lopahîn, Gayev û Sîmyonov Pîşçîk dikevin sehnê. Sîmyonov Pîşçîk pantorekî rûsî î mîna şelwerekîfireh û gomlegekî Dagistanî îji qumaşê tenik lê ye. Gava Gayev tê, ji aliyekî tevgerên ku zarî lîstikeke bîlardoyê dike.)

RANEVSKAYA: Çilo dihat gotin? Ka raweste. Ez bi lêdaneke duble ya tam di ortê de, ez ya sor dixime qulikê.

GAYEV: Ez ya sor tam dişînim quncikê! Luba, di zaroktiya xwe de ez û tu demekê di vê odê de radizan, di du qeryolên biçûk de, lê niha ez pêncî û yek salî me, bi mirov çî ecêb tê.

LOPAHÎN: Rast e, sal mîna bê derbas dibin.

20

FÎRS (Bi mereq ber bi taximên qehwê ve diçe): Wê xanim qehweyên xwe li vir vexwin. (Lepikên xwe yên spî dixê destên xwe.) Qehwe hazir e? (Bi sertî ji Dunyaşayê re.) Kanî kremaya vê keçê?

DUNYAŞA: Heywax! (Bi şaşmayîji sehnê derdikeve.)

FÎRS (Bi rêk û pêkbûneke nepêwîst di telaşa rastkirina taximê qehwê de ye): Hih! Bêkêr, tu jî! (Di ber xwe de dipeyive.) Ev e xanima min ji Parîsê vegeriyaye. Wê begê min jî biçûya Parîsê, wê çaxê - hem, li hemû menzîlan hespan diguhere. (Dikene.)

VARYA. Xêr e, Fîrs?

FÎRS. Ezbenî? (Bi dilşahî.) Xanima min vegeriyaye hêlîna xwe! Min bi çavên xwe careke din ew dît ya! Ez êdî çawekirî naçim gorê. (Hêsirên dilşahiyê dirijîne.)

(Ranevskaya, Lopahîn, Gayev û Sîmyonov Pîşçîk dikevin sehnê. Sîmyonov Pîşçîk pantorekî rûsî î mîna şelwerekîfireh û gomlegekî Dagistanî îji qumaşê tenik lê ye. Gava Gayev tê, ji aliyekî tevgerên ku zarî lîstikeke bîlardoyê dike.)

RANEVSKAYA: Çilo dihat gotin? Ka raweste. Ez bi lêdaneke duble ya tam di ortê de, ez ya sor dixime qulikê.

GAYEV: Ez ya sor tam dişînim quncikê! Luba, di zaroktiya xwe de ez û tu demekê di vê odê de radizan, di du qeryolên biçûk de, lê niha ez pêncî û yek salî me, bi mirov çî ecêb tê.

LOPAHÎN: Rast e, sal mîna bê derbas dibin.

20

GAYEV: Çawa, çawa?

LOPAHIN: Min got dem mîna bê derbas dibe.

GAYEV. Bêhneke ne xweş ji vir tê.

ANYA: Ez li vir radizêm. Şevbaş yadê. (Diya xwe maçt dike.)

RANEVSKAYA: Keçika min a xweşik! (Destê Anyayê maçî

dike.) Ma tu ji bo vegera hêlîna xwe dilşa yî? Hê jî bi min ecêb tê.

ANYA: Şevbaş, xalo.

GAYEV (Dest û rûyê Anyayê maçî dike); Xwedê temenê dirêj bide te! Tu çiqasî dişibî diya xwe! (Ji Ranevskayayê re.) Gava tu di emrê wê de bû, tu eynî dişibiya vê rewşa wê, Luba.

(Anya, Lopahîn û Sîmyonov-Pîşçîk destên xwe didine wê, ji sehnê derdikevin û derî li dû xwe digirin.)

RANEVSKAYA: Zaroka min xopan bûye!

PÎŞÇÎK: Rêwîtiyeke dirêj e, ji xwe.

VARYA (Ji Lopahîn û Pîşçîk re): Erê, begino, saet ji dudan dibuhure, dema xatirxwestinê hatiye.

RANRVSKAYA (Bi ken): Tu qet nehatiyî guhertin, Varya!

(Varya ber bi xwe dikişîne û maçî dike.) Ez vê qehweya xwe xelas bikim, paşê em ê hemû bi hev re herin. (Fîrs tabûreyeke nizim dixê binê lingê wê.) Spas şêrînê min. Ez wilo fêrî qehwê bûme ku ez bi şev û roj venexwim ez bi xwe nikanim. Spas dikim, kalikê min ê şêrîn. (Fîrs maçîdike.)

VARYA. Ka ez herim binerim bê wan hemû alav anîne hun-
21

GAYEV: Çawa, çawa?

LOPAHIN: Min got dem mîna bê derbas dibe.

GAYEV. Bêhneke ne xweş ji vir tê.

ANYA: Ez li vir radizêm. Şevbaş yadê. (Diya xwe maçî dike.)

RANEVSKAYA: Keçika min a xweşik! (Destê Anyayê maçî dike.) Ma tu ji bo vegera hêlîna xwe dilşa yî? Hê jî

bi min ecêb tê.

ANYA: Şevbaş, xalo.

GAYEV (Dest û rûyê Anyayê maçî dike); Xwedê temenê dirêj bide te! Tu çiqasî dişibî diya xwe! (Ji Ranevskayayê re.) Gava tu di emrê wê de bû, tu eynî dişibiya vê rewşa wê, Luba.

(Anya, Lopahîn û Sîmyonov-Pîşçîk destên xwe didine wê, ji sehnê derdikevin û derî li dû xwe digirin.)

RANEVSKAYA: Zaroka min xopan bûye!

PÎŞÇÎK: Rêwîtiyeke dirêj e, ji xwe.

VARYA (Ji Lopahîn û Pîşçîk re): Erê, begino, saet ji dudan dibuhure, dema xatirxwestinê hatiye.

RANRVSKAYA (Bi ken): Tu qet nehatiyî guhertin, Varya!

(Varya ber bi xwe dikişîne û maçî dike.) Ez vê qehweya xwe xelas bikim, paşê em ê hemû bi hev re herin. (Fîrs tabûreyeke nizim dixê binê lingê wê.) Spas şêrînê min. Ez wilo fêrî qehwê bûme ku ez bi şev û roj venexwim ez bi xwe nikanim. Spas dikim, kalikê min ê şêrîn. (Fîrs maçîdike.)

VARYA. Ka ez herim binerim bê wan hemû alav anîne hun-

21

dur. (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Gelo bi rasrî yê ku li vir rûdine ez im? (Bi

ken.) Ez dixwazim bireqisim, milên xwe bihejînim. (Bi destan rûyê xwe dinuxumîne.) Lê ger ev xewnek be? Xwedê zane ya, ez ji welatê xwe hez dikim. Ez ji dil jê hez dikim. Di trêne de min nikanîbû ji penceran li derve binihêriya, ez wilo digiriyam.

(Bi girî.) Neyse, ez vê qehwa xwe biqedînim.

Spas, Fîrs. Spas ji te re kalê min ê şîrîn. Ez çiqasî dilşa bûm ku min tu li jiyane dît.

FÎRS. Doh ne pêr.

GAYEY Baş deng naçiyê.

LOPAHIN. Divê ez vê sibehê, saet çar û tiştêkî bi rê bikevim, herim Harkovayê. Lê çi eksîtiye. Min dixwest ez têr li te binerim, têr bi te re rûnê û şoran bikim. Tu mîna berê dîsan xweşik î.

PÎŞÇÎK (Bêhngirtin û bêhnberdana wî zêde dibe): Ji her tim xweşiktir e, hela bi vê rewşa xwe ya ku li gorî moda Parîsê li xwe kiriye, xweşiktir bûye. Aqilê min ji serê min biriye, canê min!

LOPAHIN. Kekê we ji min re dibêje, ne qenc e, ketiyê peran e, ev e ew jî li vir e. Ew çi bixwaze dikare ji min re bibêje, ne xema min e. Hemû tiştên ku ez dixwazim, tu dîsan mîna berê bawerîya xwe bi min bîne; tiştê ez dixwazim, ku ew çavên te yê xweşik mîna berê li min binerin. Xwedê heye! Bavê min berê koleyê kalikê te bû, paşê jî yê bavê te. Lê belê te di dema xwe de ewqas qencî bi min kiriye ku min koletîya bavê xwe filan hemû ji bîr kiriye. Niha mîna ku em ji xwînekê ne, ez ji we hez

22

dur. (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Gelo bi rasrî yê ku li vir rûdine ez im? (Bi ken.) Ez dixwazim bireqisim, milên xwe bihejînim. (Bi destan rûyê xwe dinuxumîne.) Lê ger ev

xewnek be? Xwedê zane ya, ez ji welatê xwe hez dikim. Ez ji dil jê hez dikim. Di trêne de min nikanîbû ji penceran li derve binihêriya, ez wilo digiriyam.

(Bi girî.) Neyse, ez vê qehwa xwe biqedînim.

Spas, Fîrs. Spas ji te re kalê min ê şîrîn. Ez çiqasî dilşa bûm ku min tu li jiyane dît.

FÎRS. Doh ne pêr.

GAYEY Baş deng naçiyê.

LOPAHIN. Divê ez vê sibehê, saet çar û tiştê bi rê bikevim, herim Harkovayê. Lê çi eksîtiye. Min dixwest ez têr li te binerim, têr bi te re rûnê û şoran bikim. Tu mîna berê dîsan xweşik î.

PÎŞÇÎK (Bêhngirtin û bêhnberdana wî zêde dibe): Ji her tim xweşiktir e, hela bi vê rewşa xwe ya ku li gorî moda Parîsê li xwe kiriye, xweşiktir bûye. Aqilê min ji serê min biriye, canê min!

LOPAHIN. Kekê we ji min re dibêje, ne qenc e, ketiyê peran e, ev e ew jî li vir e. Ew çi bixwaze dikare ji min re bibêje, ne xema min e. Hemû tiştên ku ez dixwazim, tu dîsan mîna berê baweriya xwe bi min bîne; tiştê ez dixwazim, ku ew çavên te yê xweşik mîna berê li min binerin. Xwedê heye! Bavê min berê koleyê kalikê te bû, paşê jî yê bavê te. Lê belê te di dema xwe de ewqas qencî bi min kiriye ku min koletiya bavê xwe filan hemû ji bîr kiriye. Niha mîna ku em ji xwînekê ne, ez ji we hez

22

dikim, bi rastî hê jî jê bêtir.

RANEVSKAYA: Ez nikanim di cihê xwe de rûnê, hundurê min hildavêje. (Ji cihê xwe hol dibe, bi heyecaneke mezin diçe û tê.) Ez ê xwe li ber dilşahiyeke weha negirim. Ger tu dixwazî, bi min bikene -Ez dizanim ku ya min bêaqilî ye. Ax, dolaba min ya xweşik! (Dolabê maçîdke.) Maseya min ya xweşik.

GAYEV: Gava tu ne li vir bû, kalikê me mir.

RANEVSKAYA (Li cihê xwe rûdine û qehwa xwe vedixwe): Erê, rehma Xwedê lê be. Ji min re nivîsandibûn.

GAYEV: Anastasiya jî mir. Piyotrê hewl dev ji me berda, niha li bajêr e, li ba mufetîşê polîsan dixebite. (Qutîkek şekir ji bêrîka xwe derdixe, libek şekirê davêje devê xwe.)

PIŞÇÎK: Silavên keça min Daşenka jî li we hene.

LOPAHÎN: Nûçeyeke min ya xêrê ji we re hebû. (Çavekî davêje saeta xwe.) Divê ez herim, wextê ku qal bikim jî tune ye ku. Neyse, ez ê bi gotinekê du gotinan qal bikim. Tu dizanî, ji bo dayina deynê hîpotekê, wê bexçê we yê vîşne derkeve firotinê; dîroka firotinê jî bîst û dudê tebaxê ye. Lê, tu, xanima min a delal, qet li ber nekeve; nebe nebe, ji ber vê yeka han bila xewa te nereve, ji ber ku riyek ji vê re heye. Planekî min î weha heye. Ji kerema xwe re guhdarî bike. Malikxaneya te li ser hev bîst û pênc kîlometreyan dûrî bajêr e, hesinrê jî di ber re derbas dibe. Ger tu bexçê vîşne û erdê li ber çem parsêl bikî û bixwazî bi kirê bidî yên ku dixwazin havîngehan çêbikin, tu ê bi kêmanî îsal bîst û pênc

hezar ruble qezenc bikî.

23

dikim, bi rastî hê jî jê bêtir.

RANEVSKAYA: Ez nikanim di cihê xwe de rûnê, hundurê min hildavêje. (Ji cihê xwe hol dibe, bi heyecaneke mezin diçe û tê.) Ez ê xwe li ber dilşahiyeke weha negirim. Ger tu dixwazî, bi min bikene -Ez dizanim ku ya min bêaqilî ye. Ax, dolaba min ya xweşik! (Dolabê maçîdke.) Maseya min ya xweşik.

GAYEV: Gava tu ne li vir bû, kalikê me mir.

RANEVSKAYA (Li cihê xwe rûdine û qehwa xwe vedixwe): Erê, rehma Xwedê lê be. Ji min re nivîsandibûn.

GAYEV: Anastasiya jî mir. Piyotrê hewl dev ji me berda, niha li bajêr e, li ba mufetîşê polîsan dixebite. (Qutî-kek şekir ji bêrîka xwe derdixe, libek şekirê davêje devê xwe.)

PIŞÇÎK: Silavên keça min Daşenka jî li we hene.

LOPAHÎN: Nûçeyeke min ya xêrê ji we re hebû. (Çavekî davêje saeta xwe.) Divê ez herim, wextê ku qal bikim jî tune ye ku. Neyse, ez ê bi gotinekê du gotinan qal bikim. Tu dizanî, ji bo dayina deynê hîpotekê, wê bexçê we yê vîşne derkeve firotinê; dîroka firotinê jî bîst û dudê tebaxê ye. Lê, tu, xanima min a delal, qet li ber nekeve; nebe nebe, ji ber vê yeka han bila xewa te nereve, ji ber ku riyek ji vê re heye. Planekî min î weha heye. Ji kerema xwe re guhdarî bike. Malikxaneya te li ser hev bîst û pênc kîlometreyan dûrî bajêr e, hesinrê jî di ber re

derbas dibe. Ger tu bexçê vîşne û erdê li ber çem
parsêl bikî û bixwazî bi kirê bidî yê ku dixwazin
havîngehan çêbikin, tu ê bi kêmanî îsal bîst û pênc
hezar ruble qezenc bikî.

23

GAYEV: Bibûre, lê tiştêkî pir pûç e!

RANEVSKAYA: Ez baş tenegehîştin bê tu dixwazî çi bibêjî,
Yermolay?

LOPAHIN: Ji bo her çar donim erdê we hûn ê bîst û pênc
hezar ruble bistînin, ger hûn ji niha ve îlana wê bidin,
ez bi şerd dilîzim ku heta payizê bihustek erd
di destê we de namîne. Xelkê erdê we ji destên
hev birevînin. Bi gotinekê, ez we pîroz dikim: hûn
xelas bûn. Cihekî xweş, li kêleka çemekî kûr, mî-
na yê dewlemendekî ji sinifa yekê. Lê belê, divê
hûn berê paqij bikin, bi rêk û pêk bikin, hemû
avahiyên kevin xera bikin û di vê mala ku tu
tiştêkî wê yê bikêrhatî nemaye, divê darên bexçe jî
werine birrîn.

RANEVSKAYA: Birrîna darên bexçeyê vîşne! Li min bibûre,
lê ezîzê min tu nizanî bê tu çi dibêjî. Ger di sînore
bajarê me de tiştêkî balkêş û bi qîmet hebe, ew jî
baxçê me yê vîşne ye.

LOPAHIN: Ji mezûbûna bexçê vîşne pê ve, tiştêkî wî yê balkêş
tuneye. Ji du salan carekê ber dide, gava ber
dide jî hûn nizanin bê hûn ê çi bikin ji berê wê.
Kes naxwazin vîşneyan bikin.

GAYEV: Ev bexçe ketiye ansîklopediyan jî.

LOPAHIN (Li saeta xwe dinihêre): Ger em riyekê nebînin, em li ser tiştê negihîjin biryarekê, di bîst û dudê tebaxê de wê bexçê vîşne jî bi hemû milkê re li mazatê bête firotin. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe re biryara xwe bidin. Jê pê ve tu riyên din tune, ez sond dixwim tune - hîç tune.

FÎRS: Berê, berî çil pêncî salî vîşne hişk dikirin, tirşiya vîşne
24

GAYEV: Bibûre, lê tiştêkî pir pûç e!

RANEVSKAYA: Ez baş tenegehîştin bê tu dixwazî çî bibêjî, Yermolay?

LOPAHIN: Ji bo her çar donim erdê we hûn ê bîst û pênc hezar ruble bistîn, ger hûn ji niha ve îlana wê bidin, ez bi şerd dilîzim ku heta payizê bihustek erd di destê we de namîne. Xelkê erdê we ji destên hev birevînin. Bi gotinekê, ez we pîroz dikim: hûn xelas bûn. Cihekî xweş, li kêleka çemekî kûr, mîna yê dewlemendekî ji sinifa yekê. Lê belê, divê hûn berê paqij bikin, bi rêk û pêk bikin, hemû avahiyên kevin xera bikin û di vê mala ku tu tiştêkî wê yê bikêrhatî nemaye, divê darên bexçe jî werine birrîn.

RANEVSKAYA: Birrîna darên bexçeyê vîşne! Li min bibûre, lê ezîzê min tu nizanî bê tu çî dibêjî. Ger di sînorê bajarê me de tiştêkî balkêş û bi qîmet hebe, ew jî baxçê me yê vîşne ye.

LOPAHIN: Ji mezûbûna bexçê vîşne pê ve, tiştêkî wî yê balkêş tune. Ji du salan carekê ber dide, gava ber

dide jî hûn nizanin bê hûn ê çî bikin ji berê wê.

Kes naxwazin vîşneyan bikirin.

GAYEY: Ev bexçe ketiye ansîklopediyan jî.

LOPAHIN (Li saeta xwe dinihêre): Ger em riyekê nebînin, em li ser tiştê negihîjin biryarekê, di bîst û dudê tebaxê de wê bexçê vîşne jî bi hemû milkî re li mazatê bête firotin. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe re biryara xwe bidin. Jê pê ve tu riyên din tune, ez sond dixwim tune - hîç tune.

FÎRS: Berê, berî çîl pêncî salî vîşne hişk dikirin, tirşiya vîşne
24

çêdikirin, rîçala vîşne çêdikirin; çî vîşneyên hişkkirî...

GAYEV: Hiş be, Fîrs.

FÎRS: Erebe bi erebe vîşneyên hişkkirî dişandin Moskovayê, dişandin Harkovayê. Çî pere jê dihat! Wê çaxê vîşneyên hişkkirî, şîrîn û bêhnxeş bûn. Yên berê dizanîbûn ew ê vî karî çawan bikin.

RANEVSKAYA: Baş e, çîma niha nakin?

FÎRS. Tê jibîrkin. Kes nizane bê çawan tête çêkin.

PÎŞÇÎK (Ji Ranevskayayê re): Ji Parîsê çî xeber? We li wir beq xwarin?

RANEVSKAYA: Min tîmseh xwar.

PÎŞÇÎK. Na lê!

LOPAHÎN: Berî bi demekê li gundan gundî û axa rûdiniştin, lê niha havîngehvan derketine holê. Edî li dora hemû bajaran, hem jî li dora yê herî biçûk jî, ev malên havînê çêbûne. Ji niha û heta bîst salî, wê çend qatên din jî zêde bibe. Xwediyên van havîngehan

niha ji bilî ku ew li varandayên xwe rûnên
û çayê vexwin, tişteki nakin, lê di pêş de, ew ê bikaribin
erda ku para wan ketiye jî bajon, wê çaxê
jî dê bexçê we yê vîşne jî bigihîje şahî, dewlemendî
û rehetiya xwe. . . GAVEY (Bi qehr). Pûç e!
(Varya û Yaşa dikevin sehnê.)

VARYA. (Mifteyekê ji koma mifteyên di ber piştta xwe de
derdixe, deriyê dolabê bi deng vedike). Yadê, du
telegraf ji te re hene. Fermo.

25

çêdikirin, rîçala vîşne çêdikirin; çi vîşneyên hişkkirî...

GAYEV: Hiş be, Fîrs.

FÎRS: Erebe bi erebe vîşneyên hişkkirî dişandin Moskovayê,
dişandin Harkovayê. Çi pere jê dihat! Wê çaxê
vîşneyên hişkkirî, şîrîn û bêhnxeş bûn. Yê berê
dizanîbûn ew ê vî karî çawan bikin.

RANEVSKAYA: Baş e, çima niha nakin?

FÎRS. Tê jibîrkirin. Kes nizane bê çawan tête çêkin.

PÎŞÇÎK (Ji Ranevskayayê re): Ji Parîsê çi xeber? We li wir
beq xwarin?

RANEVSKAYA: Min tîmseh xwar.

PÎŞÇÎK. Na lê!

LOPAHÎN: Berî bi demekê li gundan gundî û axa rûdiniş-
tin, lê niha havîngehvan derketine holê. Edî li dora
hemû bajaran, hem jî li dora yê herî biçûk jî,
ev malên havînê çêbûne. Ji niha û heta bîst salî, wê
çend qatên din jî zêde bibe. Xwediyên van havîngehan
niha ji bilî ku ew li varandayên xwe rûnên

û çayê vexwin, tişteki nakin, lê di pêş de, ew ê bikaribin
erda ku para wan ketiye jî bajon, wê çaxê
jî dê bexçê we yê vîşne jî bigihîje şahî, dewlemendî
û rehetiya xwe. . . GAVEY (Bi qehr). Pûç e!
(Varya û Yaşa dikevin sehnê.)

VARYA. (Mifteyekê ji koma mifteyên di ber piştta xwe de
derdixe, deriyê dolabê bi deng vedike). Yadê, du
telegraf ji te re hene. Fermo.

25

RANEVSKAYA (Bê ku telegrafan bixwîne diçirîne). Ji Parî-
sê ye. Min êdî danûstandinên xwe ji Parîsê birîne.
GAYEV Ma tu dizanî bê ev dolaba han çiqasî kevin e, Luba?
Min hefta çûyî çavîkek ji çavîkên jêr vekiribû,
di hundurê wê de dîroka ku hatibû xeritandin li
ber çavên min ket. Tam berî bi sed salî hatiye çêkirin.
Tu ji vê re çi dibêjî ha? Yanî em dikarin sedsaliya
dolabê pîroz bikin. Ya rastî ev tişteki bêruh e,
lê dîsan jî dolabek e.

PÎŞÇÎK (Bi heyret). Sed sal! Na, lo!

GAYEV (Destê xwe dide dolabê). Erê, çi tişteki xweş e.
dolaba delal û bi hurmet! Ez hebûna te ya ku ji
sed salî zêdetir e mîna edalet û bîhnpakiyê ji welatên
biesil re xizmetê dike, pîroz dikim. Di nava vî
sedsalî de, te bi wê hebûna xwe ya bêdeng, ji bo
kirina karên bi ber her bangî mirovan kir û tu ji
vê yekê jî newestiya (Girî dikeve qirikê). Te cesaret
ji nivşekî derbasî nivşekî din kir, ji bo pêşerojeke
rohnî, te em fêrî qencyê û zanebûneke civakî

kirin. (Bêdengiyeye kurt.)

LOPAHÎN Erêweh...

RANEVSKAYA: Tu qet nehatiyê guhertin, Leonid.

GAYEV (Hebekî bi şermokî): Ez ê topa sor têxim qulika orte!

LOPAHÎN (Li saeta xwe dinihêre): Na, divê ez êdî herim.

YAŞA (Qutîkeke dermana dirêjê Ranevskaya dike): Belkî tu dixwazî hebên xwe vexwe.

PÎŞÇÎK: Qet dermanan bi kar neyne xatûna delal: ne qenciya dermanan digihîje mirov ne jî xerabiya wan.

Ka tu wan bide min. (Heban dirjîne kefa destê

26

RANEVSKAYA (Bê ku telegrafan bixwîne diçirîne). Ji Parîsê ye. Min êdî danûstandinên xwe ji Parîsê birîne.

GAYEV Ma tu dizanî bê ev dolaba han çiqasî kevin e, Luba?

Min hefta çûyî çavîkek ji çavîkên jêr vekiribû, di hundurê wê de dîroka ku hatibû xeritandin li ber çavên min ket. Tam berî bi sed salî hatiye çêkirin.

Tu ji vê re çi dibêjî ha? Yanî em dikarin sedsaliya dolabê pîroz bikin. Ya rastî ev tişteki bêruh e, lê dîsan jî dolabek e.

PÎŞÇÎK (Bi heyret). Sed sal! Na, lo!

GAYEV (Destê xwe dide dolabê). Erê, çi tişteki xweş e. dolaba delal û bi hurmet! Ez hebûna te ya ku ji sed salî zêdetir e mîna edalet û bîhnepakiyê ji welatên biesil re xizmetê dike, pîroz dikim. Di nava vî sedsalî de, te bi wê hebûna xwe ya bêdeng, ji bo kirina karên bi ber her bangî mirovan kir û tu ji vê yekê jî newestiya (Girî dikeve qirikê). Te cesaret

ji nivşekî derbasî nivşekî din kir, ji bo pêşerojeke rohnî, te em fêrî qencyê û zanebûneke civakî kirin. (Bêdengiyeke kurt.)

LOPAHÎN Erêweh...

RANEVSKAYA: Tu qet nehatiyî guhertin, Leonid.

GAYEV (Hebekî bi şermokî): Ez ê topa sor têxim qulika orte!

LOPAHÎN (Li saeta xwe dinihêre): Na, divê ez êdî herim.

YAŞA (Qutîkeke dermana dirêjî Ranevskaya dike): Belkî tu dixwazî hebên xwe vexwe.

PÎŞÇÎK: Qet dermanan bi kar neyne xatûna delal: ne qencya dermanan digihîje mirov ne jî xerabiya wan.

Ka tu wan bide min. (Heban dirjîne kefa destê

26

xwe, pifdike wan, hemûyî davêje devê xwe û qurtek kvas bi ser de vedixwe.)

RANEVSKAYA (Bi tirs): Te aqilê xwe winda kiriye!

PÎŞÇÎK: Min hemû heb daqurtandin.

LOPAHIN: Eynî mîna dîkekî elokan! (Hemû kes dikenin.)

FIRS: Di hêkesorê de mîrza li vê derê bû, di rûniştinekê de pênc kîlo tirşî xwaribû. (Di ber xwe de dipeyive.)

RANEVSKAYA: Ew dixwaze bi vê çî bibêje?

VARYA: Ev serê du salan e ew her wilo di ber xwe de dipeyive. Em êdî fêr bûne.

YAŞA: Ev ji ber kalîtiya wî ye.

(Şarlottaya zeyifokî bi kincên xwe yên spî dikeve sehnê, berçavkeke bi dox di ber piştta wê de li ba dibe.)

LOPAHIN: Bibuhure Şarlotta, min hê wext nedîtiye ku ez ji

te re bibêjim tu bi xêr hatiyî. (Dixwaze destê wê maçî bike.)

ŞARLOTTA (Destê xwe dikişîne): Ger mirov destûra te û maçîkirina dest bide, tu ê paşê bixwazî enîşkê jî maçî bikî, paşê jî navmil.

LOPAHÎN: îro qet şansa min tune. (Hemû dikenin.) Şarlotta, ka tu hunera xwe nîşan bide.

RANEVSKAYA: Şarlotta, de, lîstikekê ji me re pêşkêş bike.

ŞARLOTTA: Na, spas, ez pir bêxew im. (Derdikeve.)

LOPAHÎN: Em ê piştî sê heftan dîsan hevdu bibînin. (Destê Ranevskayayê maçî dike.) Niha di xweşiyê de bimînin.

Divê ez herim. (Ji Gayev re) Bi xatirê te.

(Pîşçîk maçî dike.) Bi xatirê te! (Pêşî destê Varya,

27

xwe, pifdike wan, hemûyî davêje devê xwe û qurtek kvas bi ser de vedixwe.)

RANEVSKAYA (Bi tirs): Te aqilê xwe winda kiriye!

PÎŞÇÎK: Min hemû heb daqurtandin.

LOPAHIN: Eynî mîna dîkekê elokan! (Hemû kes dikenin.)

FIRS: Di hêkesorê de mîrza li vê derê bû, di rûniştinekê de pênc kîlo tirşî xwaribû. (Di ber xwe de dipeyive.)

RANEVSKAYA: Ew dixwaze bi vê çî bibêje?

VARYA: Ev serê du salan e ew her wilo di ber xwe de dipeyive. Em êdî fêr bûne.

YAŞA: Ev ji ber kalîtiya wî ye.

(Şarlottaya zeyifokî bi kincên xwe yên spî dikeve sehnê, berçavkeke bi dox di ber piştta wê de li ba dibe.)

LOPAHIN: Bibuhure Şarlotta, min hê wext nedîtiye ku ez ji te re bibêjim tu bi xêr hatiyî. (Dixwaze destê wê maçî bike.)

ŞARLOTTA (Destê xwe dikişîne): Ger mirov destûra te û maçîkirina dest bide, tu ê paşê bixwazî enîşkê jî maçî bikî, paşê jî navmil.

LOPAHÎN: îro qet şansa min tune. (Hemû dikenin.) Şarlotta, ka tu hunera xwe nîşan bide.

RANEVSKAYA: Şarlotta, de, lîstikekê ji me re pêşkêş bike.

ŞARLOTTA: Na, spas, ez pir bêxew im. (Derdikeve.)

LOPAHÎN: Em ê piştî sê heftan dîsan hevdu bibînin. (Destê Ranevskayayê maçî dike.) Niha di xweşiyê de bimînin.

Divê ez herim. (Ji Gayev re) Bi xatirê te.

(Pîşçîk maçî dike.) Bi xatirê te! (Pêşî destê Varya,

27

paşê jî destên Fîrs û Yaşa dihejîne.) Ez qet naxwazim herim, lê belê ez mecbûr im herim. (Ji Ranevskayayê re) Ger tu di derheqa havîngehan de biryara xwe bidî, haya min bigihînê, ez ê bikaribim ji we re heta pêncî hezar rubleyî peyda bikim. Li ser vê yekê baş bifikire.

VARYA (Bi hêrs): De êdî here!

LOPAHÎN: Ez ê herim. (Derdikeve.)

GAYEV: Bêedeb! Na, pardon. Wê Varya bi wî re bizewice, dergîstiyê wê ye.

VARYA: Tu zêde dipeyvî xalo.

RANEVSKAYA: Lê Varya, bi rastî ez ê dilşa bibim. Ew mirovekî baş e.

PÎŞÇÎK: Bê şik ew mirovekî gelekî bi qîmet e. Daneşkaya min jî dibêje ku...lê, ji xwe ew pir tiştan dibêje. (Xirexir dike, lê tavilê şiyar dibe.) Lê çawan be, xanima delal, ma tu ê ji qenciya xwe re nikanibî 240 rubleyî bi deyn bidî min? Divê ez sibehê faîza îpoteka xwe bidim.

VARYA (Bi dehşet): Na, kopekeke me jî tune ye.

RANEVSKAYA: Bi rastî qet perê me tune ye.

PÎŞÇÎK: Çawan be ez ê ji cihekî peyda bikim. (Dikene.) Ez qet hêviya xwe nabirim. Min carekê bawer kiribû ku ez êdî mehû bûme, tu tişt hew dikare alîkariya min bike, lê belê hew min dît wa ye wan riya trê-nê di nava erdê min de çêkirine. Wan ji bo wê tibabek pere dene min. Û niha ji sedî sedî wê dîsan tiştêk bibe, ger îro nebe jî wê sibe bibe. Tew te dît ji Daşenkayê re du sed hezar ruble ji piyangoyê derketin. Wê bilêta piyangoyê kirî bû.

28

paşê jî destên Fîrs û Yaşa dihejîne.) Ez qet naxwazim herim, lê belê ez mecbûr im herim. (Ji Ranevskayayê re) Ger tu di derheqa havîngehan de biryara xwe bidî, haya min bigihînê, ez ê bikaribim ji we re heta pêncî hezar rubleyî peyda bikim. Li ser vê yekê baş bifikire.

VARYA (Bi hêrs): De êdî here!

LOPAHÎN: Ez ê herim. (Derdikeve.)

GAYEV: Bêedeb! Na, pardon. Wê Varya bi wî re bizewice, dergîstiyê wê ye.

VARYA: Tu zêde dipeyvî xalo.

RANEVSKAYA: Lê Varya, bi rastî ez ê dilşa bibim. Ew mirovekî baş e.

PÎŞÇÎK: Bê şik ew mirovekî gelekî bi qîmet e. Daneşkaya min jî dibêje ku...lê, ji xwe ew pir tiştan dibêje. (Xirexir dike, lê tavilê şiyar dibe.) Lê çawan be, xanima delal, ma tu ê ji qenciya xwe re nikanibî 240 rubleyî bi deyn bidî min? Divê ez sibehê faîza îpoteka xwe bidim.

VARYA (Bi dehşet): Na, kopekeke me jî tune ye.

RANEVSKAYA: Bi rastî qet perê me tune ye.

PÎŞÇÎK: Çawan be ez ê ji cihekî peyda bikim. (Dikene.) Ez qet hêviya xwe nabirim. Min carekê bawer kiribû ku ez êdî mehû bûme, tu tişt hew dikare alîkariya min bike, lê belê hew min dît wa ye wan riya trê-nê di nava erdê min de çêkirine. Wan ji bo wê tibabek pere dene min. Ê niha ji sedî sedî wê dîsan tişteke bibe, ger îro nebe jî wê sibe bibe. Tew te dît ji Daşenkayê re du sed hezar ruble ji piyangoyê derketin. Wê bilêta piyangoyê kirî bû.

28

RANEVSKAYA: Qehwe xelas bû. Heydê em êdî razên.

FÎRS (Gayev firçe dike, bi geflêxwarint): Te dîsan pantorê şaş li xwe kiriye. Ez ê bi te re çi bikim?

VARYA (Bi dengê nizim): Anya raza. (Bi hêdîka pencereyan vedike.) Roj bilind bûye; êdî ne zêde sar e niha.

Binihêre yadê, dar çiqas spehî ne. Xwedêyo! Lê xweşiya hewayê! Gq jî dixwîn!

GAYEV (Pencereyeke din vedike): Bexçe ji serî heta binî spî bûye. Tê bîra te Luba? Te dît riyeke mîna qayışekê ku di nava daran re rast diçû, hebû? Tê bîra te ku ew di hîverohnan de mîna zîv dibiriqî.

RANEVSKAYA (Ji pencerê li derve dinihêre): Ax, rojên zaroktiya min, rojên zaroktiya min ya saf û dilşa! Ez li vê oda zarokan radizam, min ji vê pencerê li bexçe dinihêrî. Ez her sibeh bi dilşahî radibûm, lê bexçê vîşne eynî mîna xwe î niha bû, tiştêk jê nehatiye guhertin. (Ji kêfa dikene.) Hemû spî ye, ji serî heta binî spî ye! Ax, bexçeyê min! Piştî payiza reş û bi bahoz, piştî zivistana sar tu dîsan ciwan î, dîsan dilşa yî, melekên esmên tu bi tenê nehiştiye...Ax, ger min jî bikarîba ev kevirê giran ji ser dilê xwe biavêta! Min bikarîba paşeroja xwe ji bîr bikira!

GAYEV: Dêmek wê ev bexçe di ber deynê me de bête firotin. Çi ecêbe...

RANEVSKAYA: Binihêr! Wa ye diya me ya mirî di wir re diçe... bi kincên spî! (Bi kêf dikene.) Ew bi xwe ye!

GAYEV: Kanî, li ku ye?

VARYA: Dayê can, Xwedê alîkarê te be.

29

RANEVSKAYA: Qehwe xelas bû. Heydê em êdî razên.

FÎRS (Gayev firçe dike, bi geflêxwarint): Te dîsan pantorê şaş li xwe kiriye. Ez ê bi te re çî bikim?

VARYA (Bi dengê nizim): Anya raza. (Bi hêdîka pencereyan

vedike.) Roj bilind bûye; êdî ne zêde sar e niha.
Binihêre yadê, dar çiqas spehî ne. Xwedêyo! Lê
xweşiya hewayê! Gq jî dixwînin!

GAYEV (Pencereyeke din vedike): Bexçe ji serî heta binî spî
bûye. Tê bîra te Luba? Te dît riyeke mîna qayişekê
ku di nava daran re rast diçû, hebû? Tê bîra te ku
ew di hîverohnan de mîna zîv dibiriqî.

RANEVSKAYA (Ji pencerê li derve dinihêre): Ax, rojên zaroktiya
min, rojên zaroktiya min ya saf û dilşa! Ez
li vê oda zarokan radizam, min ji vê pencerê li bexçe
dinihêrî. Ez her sibeh bi dilşahî radibûm, lê
bexçê vîşne eynî mîna xwe î niha bû, tiştekan jê nehatiye
guhertin. (Ji kêfa dikene.) Hemû spî ye, ji
serî heta binî spî ye! Ax, bexçeyê min! Piştî payiza
reş û bi bahoz, piştî zivistana sar tu dîsan ciwan î,
dîsan dilşa yî, melekên esmên tu bi tenê nehiştiye...Ax,
ger min jî bikarîba ev kevirê giran ji ser
dilê xwe biavêta! Min bikarîba paşeroja xwe ji bîr
bikira!

GAYEV: Dêmek wê ev bexçe di ber deynê me de bête firotin.
Çi ecêbe...

RANEVSKAYA: Binihêr! Wa ye diya me ya mirî di wir re
diçe... bi kincên spî! (Bi kêf dikene.) Ew bi xwe
ye!

GAYEV: Kanî, li ku ye?

VARYA: Dayê can, Xwedê alîkarê te be.

29

RANEVSKAYA: Kes tune ye cana min, ji xwe min wilo

got. Li milê rastê, ew dara xwar ya ku rê ji sitareyê dizîvire ser heye ya. Ew eynî dişibe jinekê.

(Trofîmov bi unîformayekî xwendevanan yê kevin û jihevdeketî û bi berçavkeke li ber çavan dikeve sehnê.)

RANEVSKAYA: Ev çi bexçeyekî sêhrane ye. Komên gulên spî boz, asmanê şipî şîn.

TROFÎMOV: Madam! (Ranevskaya serê xwe dizîvirîne û lê dinihêre.) Ji bo ku ez ji te re bibêjim "tu çawa yî" ez hatime, ez ê tavilê herim. (Destê Ranevskayayê ji dil maçî dike.) Wan ji min xwestin ku ez heta sibehê bimînîm, lê ez namînîm.

(Ranevskaya bi ecêbmayî lê dinihêre.)

VARYA (Bi çavên hêsir): Ev Piyotr Trofîmov e.

TROFÎMOV: Piyotr Trofîmov; ez mamosteyê Grîşayê we bûm. Ma qey ez ewqasî pir hatime guhertin? (Ranevskaya wîhemêz dike û bêdeng digirî.)

GAYEV (Aciz e): Heydê, heydê niha, Luba!

VARYA (Bi girî): Petya, min ji we re gotibû ku hetanî sibehê li vir bimînîm.

RANEVSKAYA: Grîşayê min î biçûk! Lawikê min! Lawikê min ê bi tenê . . .Grîşa. . . VARYA: Qedera wî weha bû yadê, emrê Xwedê ye.

30

RANEVSKAYA: Kes tune ye cana min, ji xwe min wilo got. Li milê rastê, ew dara xwar ya ku rê ji sitareyê dizîvire ser heye ya. Ew eynî dişibe jinekê.

(Trofîmov bi unîformayekî xwendevanan yê kevin

û jîhevdeketî û bi berçavkeke li ber çavan dikeve sehnê.)

RANEVSKAYA: Ev çi bexçeyekî sêhrane ye. Komên gulên spî boz, asmanê şipî şîn.

TROFÎMOV: Madam! (Ranevskaya serê xwe dizîvirîne û lê dinihêre.) Ji bo ku ez ji te re bibêjim "tu çawa yî" ez hatime, ez ê tavilê herim. (Destê Ranevskayayê ji dil maçî dike.) Wan ji min xwestin ku ez heta sibehê bimînim, lê ez namînim.

(Ranevskaya bi ecêbmayî lê dinihêre.)

VARYA (Bi çavên hêsir): Ev Piyotr Trofîmov e.

TROFÎMOV: Piyotr Trofîmov; ez mamosteyê Grîşayê we bûm. Ma qey ez ewqasî pir hatime guhertin?

(Ranevskaya wîhemêz dike û bêdeng digirî.)

GAYEV (Aciz e): Heydê, heydê niha, Luba!

VARYA (Bi girî): Petya, min ji we re gotibû ku hetanî sibehê li vir bimînin.

RANEVSKAYA: Grîşayê min î biçûk! Lawikê min! Lawikê min ê bi tenê . . . Grîşa. . . VARYA: Qedera wî weha bû yadê, emrê Xwedê ye.

30

TROFÎMOV (Girî dikeve qirikê, bi dengê nerm): Çi dibe, megrî!

RANEVSKAYA (Bêdeng bêdeng digirî): Xeniqê û mir. Lawikê min xeniqê. Ji bo çi? Çima canê min? (Bi dengê hê nizimtir.) Anya li hundur radizê, lê ez jî li vir bi dengê bilind dipeyivim û qelebalixê dikim... Lê tu ji min re bêje Pîyotr, ji bo çi tu evqasî ketiyî?

Çima tu evqasî pîr bûyî?

TROFÎMOV: Gava ez bi trêne hatim, jineke gundî ji min re got, Mîrza Kalo.

RANEVSKAYA: Tu wê çaxê hema hema zarok bû, xwendevanekî şîrîn bû, lê niha porê te firk bûye û tu berçavkê bi kar tînî. Ma bi rastî tu hê jî xwendevan î?
(Ber bi derîve dimeşe.)

TROFIMOV: Erê, ez bawer im ez ê her xwendevan bimînim.

RANEVSKAYA (Pêşî kekê xwe paşê jt Varyayê maçî dike): Eh, de êdî razên. Tu jî pîr bûyî Leonîd.

PIŞÇÎK (Dide dû Ranevskayayê): Dêmek wextê xewa me hat. Ax, ax ev lingê min! Wê çaxê ez şeva xwe li vir bubuhurînim. Tu ji bîr nekî meleka min, divê ez... 240 rubleyî...

GAYEV: Ew dev jê bernade.

PÎŞÇÎK: Ji bo faîza îpoteka min 240 ruble.

RANEVSKAYA: Perê min tune ye, dostê min.

PÎŞÇÎK: Ez ê li te vegeînim xanima şîrîn. Ji xwe ne pereyekî pire.

RANEVSKAYA: Wêw, baş e, wê Leonîd bide te. Ka bidiyê, Leonîd.

GAYEV: Bidiyê ha? Ew ê hê pir li bende be.

31

TROFÎMOV (Girî dikeve qirikê, bi dengekî nerm): Çi dibe, megrî!

RANEVSKAYA (Bêdeng bêdeng digirî): Xeniqê û mir. Lawikê min xeniqê. Ji bo çi? Çima canê min? (Bi dengekî

hê nizimtir.) Anya li hundur radizê, lê ez jî li
vir bi dengê bilind dipeyivim û qelebalixê dikim...

Lê tu ji min re bêje Pîyotr, ji bo çi tu evqasî ketiyî?

Çima tu evqasî pîr bûyî?

TROFÎMOV: Gava ez bi trêne hatim, jineke gundî ji min re
got, Mîrza Kalo.

RANEVSKAYA: Tu wê çaxê hema hema zarok bû, xwendevanekî
şîrîn bû, lê niha porê te firk bûye û tu berç-

avkê bi kar tîni. Ma bi rastî tu hê jî xwendevan î?

(Ber bi derîve dimeşe.)

TROFIMOV: Erê, ez bawer im ez ê her xwendevan bimî-
nim.

RANEVSKAYA (Pêşî kekê xwe paşê jt Varyayê maçî dike):

Eh, de êdî razên. Tu jî pîr bûyî Leonîd.

PIŞÇÎK (Dide dû Ranevskayayê): Dêmek wextê xewa me
hat. Ax, ax ev lingê min! Wê çaxê ez şeva xwe li
vir bubuhurînim. Tu ji bîr nekî meleka min, divê
ez... 240 rubleyî...

GAYEV: Ew dev jê bernade.

PÎŞÇÎK: Ji bo faîza îpoteka min 240 ruble.

RANEVSKAYA: Perê min tune ye, dostê min.

PÎŞÇÎK: Ez ê li te vegeînim xanima şîrîn. Ji xwe ne pereyekî
pire.

RANEVSKAYA: Wêw, baş e, wê Leonîd bide te. Ka bidiyê,
Leonîd.

GAYEV: Bidiyê ha? Ew ê hê pir li bende be.

31

RANEVSKAYA: Çareyeke din tune ye, hewcedariya wî pê

heye. Wê li me vegeîne.

(Ranevskaya, Trofîmov, Pîşçîk û Fîrs derdikevin.)

GAYEV: Xweha min hê nehatiye guhertin, ew pereyên xwe vir de û wê de direşîne. (Ji Yaşa re) Xwe bide alî dosto, bêhna mirîşkan ji te tê.

YAŞA (Bi ken): Tu jî qet nehatiyê guhertin, ezbenî!

GAYEV: Bubuhure? (Ji Varya re): Vî çi got?

VARYA (Ji Yaşa re): Diya te ji gund hatiye vir. Ji doh ve ew li beşa xizmetkaran, li bendî te ye. Dixwaze te bibîne.

YAŞA: Heqêwêye.

VARYA: Şerm bike!

YAŞA: Oo, çi karê min bi wê heye? Ma ew nikanîbû sibe bihata? (Derdikeve.)

VARYA: Diya min berê çi bû, dîsan ew e, bi qasî misqalekî nehatiye guhertin. Ger bi wê bimîne, ew ê hertiştê xwe belav bike.

GAYEV: Erê. (Bêdengiyê kurt.) Ger li dijî nexweşiyekê tibabek derman bête hêvîkirin, tê wê manê ku ew nexweşiyê bêderman e. Ji mêj ve ye ez difikirim, ez mêjiyê xwe diwestinim. Gelek çareserkirin têne bîra min, ev jî tê wê maneyê ku tu çare tune ye. Ger em li ser serwetekê rûniştana an jî me Anya bidaya mêrekî dewlemend, wê çi baş bibûya. An jî ger ez biçûma Yaroslavê û min hinek pere ji xaltiya xwe ya kontês bixwesta. Ew pir dewlemend e.

VARYA (Bi girt): Xwedê alîkarê te be.

32

RANEVSKAYA: Çareyêke din tune ye, hewcedariya wî pê

heye. Wê li me vegeîne.

(Ranevskaya, Trofîmov, Pîşçîk û Fîrs derdikevin.)

GAYEV: Xweha min hê nehatiye guhertin, ew pereyên xwe vir de û wê de direşîne. (Ji Yaşa re) Xwe bide alî dosto, bêhna mirîşkan ji te tê.

YAŞA (Bi ken): Tu jî qet nehatiyê guhertin, ezbenî!

GAYEV: Bubuhure? (Ji Varya re): Vî çî got?

VARYA (Ji Yaşa re): Diya te ji gund hatiye vir. Ji doh ve ew li beşa xizmetkaran, li bendî te ye. Dixwaze te bibîne.

YAŞA: Heqêwêye.

VARYA: Şerm bike!

YAŞA: Oo, çî karê min bi wê heye? Ma ew nikanîbû sibe bihata? (Derdikeve.)

VARYA: Diya min berê çî bû, dîsan ew e, bi qasî misqalekî nehatiye guhertin. Ger bi wê bimîne, ew ê hertiştê xwe belav bike.

GAYEV: Erê. (Bêdengiyê kurt.) Ger li dijî nexweşiyekê tibabek derman bête hêvîkirin, tê wê manê ku ew nexweşiyê bêderman e. Ji mêj ve ye ez difikirim, ez mêjiyê xwe diwestinim. Gelek çareserkirin têne bîra min, ev jî tê wê maneyê ku tu çare tune ye. Ger em li ser serwetekê rûniştana an jî me Anya bidaya mêrekî dewlemend, wê çî baş bibûya. An jî ger ez biçûma Yaroslavê û min hinek pere ji xaltiya xwe ya kontês bixwesta. Ew pir dewlemend e.

VARYA (Bi girt): Xwedê alîkarê te be.

32

GAYEV: Dengê xwe bibirre. Jixwe xaltiya min dewlemend

e, lê navbera me ne baş e. Berî her tiştî xweha me ne bi esilzadeyekî re, lê çû bi avûkatekî re zewicî.
(Anya li ber derîxuya dibe.)

GAYEV: Ji ber ku ew bi yekî esilzade re nezewicî ye, mirov nikane bibêje ew jiyaneke bêhnpakî dijî. Ew jineke heya tu bibêjî şîrîn, baş û dostane ye. Ez jê pir hez dikim, lê tu li çî sebebên sivikirinê difikirî bifikire, tu dîsan jî nikanî înkâr bikî ku ew ne jineke gunehkar e. Ev yeka han ji her tevgera wê xuya dibe.

VARYA (Bi pistînî): Anya li ber derî ye.

GAYEV: Bubuhure? (Bêdengiyeye kurt): Pir ecêb e, tiştê kete çavê min yê rastê. Ez baş nabînim. Pêncşema çûyî gava ez li mehkemeya bajêr bûm...
(Anya dikeve hundur.)

VARYA: Tu ji bo çî ranazê, Anya?

ANYA: Ez nikanim razê. Bêîmkan e.

GAYEV: Zaroka min! (Dest û rûyê Anyayê maçî dike.) Keçika min! (Digirî.) Tu ne xwarziya min, tu meleka min î, tu her tiştî min î. Bawer bike... bawer bike, wilo ye!

ANYA: Ez ji te bawer dikim xalo. Her kes ji te hez dike, xatirê te digire, lê xalê min ê delal, diviyabû te gotinên wilo negotiba, xwezî tu hîç nepeyiviya. A niha te çî di derheqa diya min digot, di derheqa

33

GAYEV: Dengê xwe bibirre. Jixwe xaltiya min dewlemend e, lê navbera me ne baş e. Berî her tiştî xweha me

ne bi esilzadeyekî re, lê çû bi avûkatekî re zewicî.

(Anya li ber derîxuya dibe.)

GAYEV: Ji ber ku ew bi yekî esilzade re nezewicî ye, mirov nikane bibêje ew jiyaneke bêhnpakî dijî. Ew jineke heya tu bibêjî şîrîn, baş û dostane ye. Ez jê pir hez dikim, lê tu li çî sebebên sivikirinê difikirî bifikire, tu dîsan jî nikanî înkâr bikî ku ew ne jineke gunehkar e. Ev yeka han ji her tevgera wê xuya dibe.

VARYA (Bi pistînî): Anya li ber derî ye.

GAYEV: Bubuhure? (Bêdengiyeye kurt): Pir ecêb e, tiştê kete çavê min yê rastê. Ez baş nabînim. Pêncşema çûyî gava ez li mehkemeya bajêr bûm...

(Anya dikeve hundur.)

VARYA: Tu ji bo çî ranazê, Anya?

ANYA: Ez nikanim razê. Bêîmkan e.

GAYEV: Zaroka min! (Dest û rûyê Anyayê maçî dike.) Keçika min! (Digirî.) Tu ne xwarziya min, tu meleka min î, tu her tiştî min î. Bawer bike... bawer bike, wilo ye!

ANYA: Ez ji te bawer dikim xalo. Her kes ji te hez dike, xatirê te digire, lê xalê min ê delal, diviyabû te gotinên wilo negotiba, xwezî tu hîç nepeyiviya. A niha te çî di derheqa diya min digot, di derheqa

33

xweha xwe de? Ê ji bo çî te ew qise kirin?

GAYEV: Erê, erê. (Bi destên Anyayê rûyê xwe dinuxumîne.)

Tu rast dibêjî, ev şaşiyeye ecêb e! Xwedêyo! Tu

alîkariya min bikî! Hê berî bi kurtedemekê ez ji dolabê re peyivî bûm. Ev çi dînîtî ye! Min tavi lê fêhm kiribû ku dînîrî ye.

VARYA: Erê, pir rast e, xalo. Divê tu hindik bipeyivî. An jî qet mepeyive çêtir e.

ANYA: Ger tu jî vê bikî wê ji bo te baştir be.

GAYEV: Ez ê bêdeng bibim! (Destê Anya û Varyayê maçî dike.) Ez devê xwe jî venakim. Tenê ez ê di derheqa kar de tiştê bibêjim. Pêncşema çûyî gava ez çûbûm mehkema bajêr, ez li gelek nasan rast hatibûm.

Tabî em ji vir de û wir de peyivîn, tiştê xuya dibe, ji bo ez bikaribim faîza bankê bidim, ez ê li hemberî senedê bikaribim hinek pere deyn bikim.

VARYA: Tenê ku Xwedê bixwaze!

GAYEV: Ez ê roja sêşemê herim careke din bi wan re bipeyivim.

(Ji Varyayê re.) Giriya xwe bibirre. (Ji Anyayê re.) Wê diya te û Lopahîn hevdu bibînin. Tabî wê Lopahîn red neke. Piştî ku tu jî bêhna xwe berdî, divê tu herî Yaroslavlê û pîrka xwe ya kontes bibînî. Em ê wilo ji sê milan ve têkevin hereketê û karê xwe saxlem bikin. Em ê dawî dawî vê faîzê bidin, ez bi vê yekê bawer im. (Şekirêkî davê-je devê xwe.) Ez bi şerefa xwe û bi tiştê tu dixwazî sond dixum ku wê ev milk neyê firotin. (Bi heyecan.) Ez bi dilşahiya xwe sond dixum! Ev e, ez li vir ji te re soz didim, ger ez vî milkê derxim mazatê, tu jî ji min re bêjî, bêxîret, neqenc. Ez bi ruhê

xweha xwe de? Û ji bo çi te ew qise kirin?

GAYEV: Erê, erê. (Bi destên Anyayê rûyê xwe dinuxumîne.)

Tu rast dibêjî, ev şaşiyê ecêb e! Xwedêyo! Tu alîkariya min bikî! Hê berî bi kurtedemekê ez ji dolabê re peyivî bûm. Ev çi dînîtî ye! Min tavilê fêhm kiribû ku dînîrî ye.

VARYA: Erê, pir rast e, xalo. Divê tu hindik bipeyivî. An jî qet mepeyive çêtir e.

ANYA: Ger tu jî vê bikî wê ji bo te baştir be.

GAYEV: Ez ê bêdeng bibim! (Destê Anya û Varyayê maçî dike.) Ez devê xwe jî venakim. Tenê ez ê di derheqa kar de tiştê bibêjim. Pêncşema çûyî gava ez çûbûm mehkema bajêr, ez li gelek nasan rast hatibûm.

Tabî em ji vir de û wir de peyivîn, tiştê xuya dibe, ji bo ez bikaribim faîza bankê bidim, ez ê li hemberî senedê bikaribim hinek pere deyn bikim.

VARYA: Tenê ku Xwedê bixwaze!

GAYEV: Ez ê roja sêşemê herim careke din bi wan re bipeyivim.

(Ji Varyayê re.) Giriya xwe bibirre. (Ji Anyayê re.) Wê diya te û Lopahîn hevdu bibînin. Tabî wê Lopahîn red neke. Piştî ku tu jî bêhna xwe berdî, divê tu herî Yaroslavlê û pîrka xwe ya kontes bibînî. Em ê wilo ji sê milan ve têkevin hereketê û karê xwe saxlem bikin. Em ê dawî dawî vê faîzê bidin, ez bi vê yekê bawer im. (Şekirekî davêje devê xwe.) Ez bi şerefa xwe û bi tiştê tu dixwazî sond dixum ku wê ev milk neyê firotin. (Bi heyecan.) Ez bi dilşahiya xwe sond dixum! Ev e, ez li

vir ji te re soz didim, ger ez vî milkî derxim mazatê,
tu jî ji min re bêjî, bêxîret, neqenc. Ez bi ruhê

34

xwe yên jîndar sond dixum!

ANYA (Dîsan rehet bûye, dilşa ye): Tu çî şekir î xalo, tu çiqaz
biaqil î! (Xalê xwe hemêz dike.) Êdî ez bêhnfireh
im. Dilê min rehet e! Ez dilşa me!

(Fîrs dikeve sehnê.)

FÎRS (Bi erzşikandinî): Qey tu ji Xwedê natirsî? Tu ê kengî
razê?

GAYEV: Tavalê, a niha. Tu here Fîrs, ez dikanim bêî te jî
kincên xwe ji xwe bikim, xwe bi xwe. Heydê zaronu,
bay-bay! Em ê sibehê li ser detayan

bipeyivin, em niha razên. (Anyayê û Varyayê maçî dike.)

Ez peyayê hezar û heşt sed û heştêyan im. Kes
wan deman naecibîne, lê min jî ji ber baweriyên
xwe hindik nekişandiye. Divê mirov gundiyan ji
nêzîk ve nas bike, divê mirov bizanibe bi kê re...

ANYA: Va ye te dîsan dest pê kir, xalo!

VARYA: Ger te bikanîba ew devê xwe bigirta, xalê min yê
delal.

FÎRS (Bi hêrs): Beg efendî!

GAYEV: Ez tîm. Ez ê niha herim razê. Du lêdanên nerm li
topên ortê! (Derdikeve, Fîrs jî lingên xwe bi erdê
ve dikişîne û dide dû wî.)

ANYA: Êdî dilê min rehet e. Ez qet naxwazim herim Yaroslavlayê:
Ez ji pîrka xwe hez nakim, lê xalê min dilê
min rehet kir. (Rûdine.)

VARYA: Dema xewê hatiye. Ez diçim. Gava tu li derveyî welêt bû li vir rezaletêk çêbû. Tu dizanî, li beşa xulamên pîr, ji pîran pê ve kes namînin. Yefîm,
35

xwe yên jîndar sond dixum!

ANYA (Dîsan rehet bûye, dilşa ye): Tu çî şeker î xalo, tu çiqaz bîaqil î! (Xalê xwe hemêz dike.) Êdî ez bêhnfireh im. Dilê min rehet e! Ez dilşa me!

(Fîrs dikeve sehnê.)

FÎRS (Bi erzşikandinî): Qey tu ji Xwedê natirsî? Tu ê kengî razê?

GAYEV: Tavlê, a niha. Tu here Fîrs, ez dikanim bê te jî kincên xwe ji xwe bikim, xwe bi xwe. Heydê zaronê, bay-bay! Em ê sibehê li ser detayan

bipeyivin, em niha razên. (Anyayê û Varyayê maçî dike.)

Ez peyayê hezar û heşt sed û heştêyan im. Kes wan deman naecibîne, lê min jî ji ber baweriyên xwe hindik nekişandiye. Divê mirov gundiyan ji nêzîk ve nas bike, divê mirov bizanibe bi kê re...

ANYA: Va ye te dîsan dest pê kir, xalo!

VARYA: Ger te bikanîba ew devê xwe bigirta, xalê min yê delal.

FÎRS (Bi hêrs): Beg efendî!

GAYEV: Ez tîm. Ez ê niha herim razê. Du lêdanên nerm li topên ortê! (Derdikeve, Fîrs jî lingên xwe bi erdê ve dikişîne û dide dû wî.)

ANYA: Êdî dilê min rehet e. Ez qet naxwazim herim Yaroslavlayê: Ez ji pîrka xwe hez nakim, lê xalê min dilê

min rehet kir. (Rûdine.)

VARYA: Dema xewê hatiye. Ez diçim. Gava tu li derveyî welêt bû li vir rezaletê çêbû. Tu dizanî, li beşa xulamên pîr, ji pîran pê ve kes namînin. Yefîm, 35

Polya, Yevstîngey û yek jî Karp. Lê belê wan hemû rêwiyên ku dixwestin şeva xwe bibuhurînin bera hundur dan. Min tiştê negot. Lê min paşê bihîst ku yanî ji bilî nokan tu xwarin nedaye wan. Ev jî yanî min ji çikûsiya xwe kiriye. Tabî ev hemû ji ber serê Yevstîngey derdikevin. "Bila wilo be," min got, "madem we ev kar gihande heta vir, ez ê jî nîşanî we bidim." Min bangî Yevstîngey kir, "li min binêre, kalê dînik, tu çawa dibe ku" (Li Anyayê dinêre.) Anya! (Kurtebêdengiyek.) Razaye. (Dikeve milê Anyayê.) Heydê razê, de were. (Anyayê bi kişandin dibe.) Bifikire, niha diviyabû tu razaba! De were cana min! (Ber bi odeya Anyayê ve diçin. Ji dûr ve, li aliyê bexçe yê wî alî dengê bilûra şivanekî tê. Gava Trofîmov di sehnê re derbas dibe û çav li Varya û Anyayê dikeve, radiweste.)

VARYA: Hişş! Radizê. Were cana min.

ANYA (Bi xilmaşt): Ez wilo betilî me ku! Ev dengê naqoza dêran e! Xalo! Yadê! Xalo!

VARYA: Were cana min! Heydê xweşika min.

(Varya û Anya ji sehnê dikevin odeya Anyayê.)

TROFÎMOV (Bi hezkirin): Roja min! Bihara min!

PERDE

36

Polya, Yevstîngey û yek jî Karp. Lê belê wan hemû rêwiyên ku dixwestin şeva xwe bibuhurînin bera hundur dan. Min tişteke negot. Lê min paşê bihîst ku yanî ji bilî nokan tu xwarin nedaye wan. Ev jî yanî min ji çikûsiya xwe kiriye. Tabî ev hemû ji ber serê Yevstîngey derdikevin. "Bila wilo be," min got, "madem we ev kar gihande heta vir, ez ê jî nîşanê we bidim." Min bangê Yevstîngey kir, "li min binêre, kalê dînik, tu çawa dibe ku" (Li Anyayê dinêre.) Anya! (Kurtebêdengiyek.) Razaye. (Dikeve milê Anyayê.) Heydê razê, de were. (Anyayê bi kişandin dibe.) Bifikire, niha diviyabû tu razaba! De were cana min! (Ber bi odeya Anyayê ve diçin. Ji dûr ve, li aliyê bexçe yê wî alî dengê bilûra şivanekî tê. Gava Trofîmov di sehnê re derbas dibe û çav li Varya û Anyayê dikeve, radiweste.)

VARYA: Hişş! Radizê. Were cana min.

ANYA (Bi xilmaşt): Ez wilo betilî me ku! Ev dengê naqoza dêran e! Xalo! Yadê! Xalo!

VARYA: Were cana min! Heydê xweşika min.

(Varya û Anya ji sehnê dikevin odeya Anyayê.)

TROFÎMOV (Bi hezkirin): Roja min! Bihara min!

PERDE

36

PERDADUWEMÎN

(Çolek. Dêreke kevin ku ji mêj ve dev jê hatiye berdan. Li ba dêrê bîrek heye; kevirên pehn î mezin, ku mîna kevirên gorran, an jî mîna yên bankeke kevin dixuyin. Ji aliyê wî alî ve riyek diçe malixanê. Ji aliyekî ve jî sphidarên tarî xuya dibin. Ji wir jî bexçê vtşne dest pê dike. Ji dûr ve rêzedîregên telegrafan, hê dûrtir jî nêzîkî asoyê, di hewayên gelekî xweş û vekirî de, sîlueta bajarekî xuya dike. Roj li ber ava ye. Sarlotta, Yaşa û Dunyaşa li ser bankê rûniştine. Nêzîkî wan jî Yepîhodov li ser lingan rawestiyaye û li gîtarê dixê. Hemû diftkirin. Li serê Şarlottayê kumekî nêçîrvanan heye. Ew qulpika qayîşa tivinga ku wê ji milê xwe kiriye, rastdike.)

ŞARLOTTA (Bi fikir): Hê paseporteke min î rast jî tune ye. Ez nizanîm bê ez çend salî me. Ez xwe bi xwe dibêjim, ez hê ciwan im. Gava ez keçikeke biçûk bûm, ez bi dê û bavê xwe re mazat bi mazat digeriyam û me lîstik pêşkêş dikirin, hem jî lîstikên xweş. Min jî teqle davêtin û hinek cambaziyên din jî dikir. Gava dê û bavê min mirin, pîrejineke alman ez birim ba xwe û ez dame xwendin. Pir baş

37

PERDADUWEMÎN

(Çolek. Dêreke kevin ku ji mêj ve dev jê hatiye berdan. Li ba dêrê bîrek heye; kevirên pehn î mezin, ku mîna kevirên gorran, an jî mîna yên bankeke kevin dixuyin. Ji aliyê wî alî ve riyek diçe

malikxanê. Ji aliyekî ve jî sphidarên tarî xuya dibin. Ji wir jî bexçê vtşne dest pê dike. Ji dûr ve rêzedîregên telegrafan, hê dûrtir jî nêzîkî asoyê, di hewayên gelekî xweş û vekirî de, sîlueta bajarekî xuya dike. Roj li ber ava ye. Sarlotta, Yaşa û Dunyaşa li ser bankê rûniştine. Nêzîkî wan jî Yepîhodov li ser lingan rawestiyaye û li gîtarê dixwe. Hemû diftkirin. Li serê Şarlottayê kumekî nêçîrvanan heyê. Ew qulpika qayîşa tivinga ku wê ji milê xwe kiriye, rastdike.)

ŞARLOTTA (Bi fikir): Hê paseporteke min î rast jî tune ye. Ez nizanim bê ez çend salî me. Ez xwe bi xwe dibêjim, ez hê ciwan im. Gava ez keçikeke biçûk bûm, ez bi dê û bavê xwe re mazat bi mazat digeriyam û me lîstik pêşkêş dikirin, hem jî lîstikên xweş. Min jî teqle davêtin û hinek cambaziyên din jî dikir. Gava dê û bavê min mirin, pîrejineke alman ez birim ba xwe û ez dame xwendin. Pir baş

37

bû. Gava ez mezin bûm, ez bûme perwerdekar. Lê ez kî me, an jî ji ku hatime, qet haya min jê tune. Dê û bavê min kî bûn, ez nizanim. Bi gumaneke mezin ew ne zewicî bûn jî. (Ji bêrîka xwe xiyarekt derdixwe û dixwe.) Ez bi tiştêkî nizanim. (Kurtebêdengiyek.) Ez dixwazim derdê xwe ji hinan re bibêjim, lê kesî min tune ye, ne dostek, ne jî merivek.

YEPÎHODOV (Li gîtarê dixwe û stranên dibêje): "Min çî ji dinyayê ye, çî ji hay û hûyê, çî ji dost û neyaran?..."

Çi xweş e lêdana mandolînê!

DUNYAŞA: Ewa ku tu lê dixî ne mandolîn e, gîtar e. (Bi neynikeke bêrîkan li xwe dinihêre û rûyê xwe podra dike.)

YEPÎHODOV: Lê ji bo dildarekî ku aqil di serî de nemaye, ev mandolî e. (Stranan dibêje.)

"Ax, ger dilê min bi germahiya evînê germ bibûya."

(Yaşa jî pê re dibêje.)

ŞARLOTTA: Ev çiqasî nexweş distirên!...Mîna wawîkan diqîrin!

DUNYAŞA (Ji Yaşa re): Gerr û mayina li welatên derve divê pir xweş e!

YAŞA: Erê, ez bi te re. (Dibawişke û puroyekê pêdixe.)

YEPÎHODOV: Bêşik. Li Ewrûpayê her tişt ketiye rê.

YAŞA: Rast e, wilo ye.

YEPÎHODOV: Ez mirovekî xwende me, min tibabek pirtû-
38

bû. Gava ez mezin bûm, ez bûme perwerdekar. Lê ez kî me, an jî ji ku hatime, qet haya min jê tune.

Dê û bavê min kî bûn, ez nizanim. Bi gumaneke mezin ew ne zewicî bûn jî. (Ji bêrîka xwe xiyarekt derdixe û dixwe.) Ez bi tiştêkî nizanim. (Kurtebêdengiyek.) Ez dixwazim derdê xwe ji hinan re bibêjim, lê kesî min tune ye, ne dostek, ne jî merivek.

YEPÎHODOV (Li gîtarê dixwe û stranan dibêje): "Min çi ji dinyayê ye, çi ji hay û hûyê, çi ji dost û neyaran?..."

Çi xweş e lêdana mandolînê!

DUNYAŞA: Ewa ku tu lê dixî ne mandolîn e, gîtar e. (Bi neynikeke bêrîkan li xwe dinihêre û rûyê xwe podra dike.)

YEPÎHODOV: Lê ji bo dildarekî ku aqil di serî de nemaye, ev mandolî e. (Stranan dibêje.)

"Ax, ger dilê min bi germahiya evînê germ bibû-ya."

(Yaşa jî pê re dibêje.)

ŞARLOTTA: Ev çiqasî nexweş distirên!...Mîna wawîkan diqîrin!

DUNYAŞA (Ji Yaşa re): Gerr û mayina li welatên derve divê pir xweş e!

YAŞA: Erê, ez bi te re. (Dibawişke û puroyekê pêdixe.)

YEPÎHODOV: Bêşik. Li Ewrûpayê her tişt ketiye rê.

YAŞA: Rast e, wilo ye.

YEPÎHODOV: Ez mirovekî xwende me, min tibabek pirtû-38

kên entresan xwendine, lê ez hê jî baş nizanim ez çi diparêzim û çi dixwazim. Gelo ez jiyana xwe berdewam bikim, an jî bi kurtî ez xwe bikujim, ez nizanim. Dîsan, digel her îhtimalê ez demançekê bi xwe re digerînim. (Demançê nîşan dide.)

ŞARLOTTA: (Tivingê davêje milê xwe): A wilo ha. Yê min va ye ez diçim. Tu peyakî pir biazil î, Yepîhodov, hem jî ecêb. Herhal jin mîna dînan dil dikevin te! Birrr! (Gava diçe.) Mirovên ku xwe biazil dibînin, bêazil in -ez di nava wan de yekî nabînim ku pê re çend qisan bikim. Ez her bi tenê me, bi tenê-

ne dostekî min heye, ne merivekî min, ne jî yekî
ku ez jê re behsa hebûna xwe bikim. (Hêdî hêdî
dimeşe û ji sehnê derdikeve.)

YEPIHODOV: Ger ez ya rastî bibêjim, û bêî ku ez mijarê
belav bikim, ez dixwazim di vir de rohnî bikim,
mîna ku bahoz bi keştiyeke biçûk bileyize, qedera
min jî bêî gazin bi min dileyize. Em bêî ez hatim
xapandin, wê çaxê çawan dibe ku gava ez vê sibehê
ji xewê şiyar dibim, ez tevnepirîkekê li ser sînga
xwe dibînim...Ha yeka wilo bû! (Bi herdu destan
nîşan dide.) Gava ez dibêjim ez ê qurtek kvas vexwim,
ji sedî sed ji nava kvasê wê tiştê nediya
derkeve, wek mînak, kêzîkek. (Kurtebêdengiyek.)
Gelo te Buckle xwendiyê? (Kurtebêdengiyek. Ji
Dunyaşayê re.) Min ê ji te tika bikira ku ez destû-
ra deqîqeyeke te bistînim.

DUNYAŞA: Kerem bike.

YEPIHODOV: Min dixwest ez bi te re bi tenê bipeyivim.
(Bêhna xwe berdide.)

39

kên entresan xwendine, lê ez hê jî baş nizanim ez
çi diparêzim û çi dixwazim. Gelo ez jiyana xwe
berdewam bikim, an jî bi kurtî ez xwe bikujim,
ez nizanim. Dîsan, digel her îhtimalê ez demanç-
ekê bi xwe re digerînim. (Demançê nîşan dide.)

ŞARLOTTA: (Tivingê davêje milê xwe): A wilo ha. Yê min
va ye ez diçim. Tu peyakî pir bîaqil î, Yepîhodov,
hem jî ecêb. Herhal jin mîna dînan dil dikevin te!

Birrr! (Gava diçe.) Mirovên ku xwe bîaqil dibîn, bêaqil in -ez di nava wan de yekî nabînim ku pê re çend qisan bikim. Ez her bi tenê me, bi tenê ne dostekî min heye, ne merivekî min, ne jî yekî ku ez jê re behsa hebûna xwe bikim. (Hêdî hêdî dimeşe û ji sehnê derdikeve.)

YEPIHODOV: Ger ez ya rastî bibêjim, û bêî ku ez mijarê belav bikim, ez dixwazim di vir de rohnî bikim, mîna ku bahoz bi keştiyeke biçûk bileyize, qedera min jî bêî gazin bi min dileyize. Em bêjin ez hatim xapandin, wê çaxê çawan dibê ku gava ez vê sibehê ji xewê şiyar dibim, ez tevnepirîkekê li ser sînga xwe dibînim...Ha yeka wilo bû! (Bi herdu destan nîşan dide.) Gava ez dibêjim ez ê qurtek kvas vexwim, ji sedî sed ji nava kvasê wê tişteki nediyar derkeve, wek mînak, kêzîkek. (Kurtebêdengiyek.) Gelo te Buckle xwendiyê? (Kurtebêdengiyek. Ji Dunyaşayê re.) Min ê ji te tika bikira ku ez destûra deqîqeyeke te bistînim.

DUNYAŞA: Kerem bike.

YEPIHODOV: Min dixwest ez bi te re bi tenê bipeyivim. (Bêhna xwe berdide.)

39

DUNYAŞA (Bi şerm): Baş e. Wê çaxê pelerîne min ji min re bîne. Li ba garderobê ye. Vir hinekî bi rutûbet e.

YEPIHODOV: Baş e, ez ê tavilê bînim. Min êdî fêhm kir ku ez ê bi demançaya xwe çî bikim. (Radihîje gîtara xwe, lê dixê û diçe.)

YAŞA: Bela! Di nava me de, ew gêjikek e. (Dibawîşke.)

DUNYAŞA: Xwedê neke ew xwe nekuje. (Kurtebêdengiyek.)

Ez ewqasî aciz im ku ez her tim di hundurê endîşeyekê de me. Gava wan ez anîme mala xanimjina me, ez hê biçûk bûm, tabî ez niha ji wan hemû tiştên basîd xelas bûme, destên min jî mîna destên xanimekê spîboz e. Ez wilo hisî, wilo hasas hatime mezinkirin ku ez ji her tiştî ditirsim. Di hundurê min de her tim tirsek heye. Ger tu min bixapînî, ez êdî nizamim bê wê sinirê min çawan bibe.

YAŞA (Wê maçî dike): Ax, tu çî şekir î! Di gel vê, divê keçikek qet xwe ji bîr neke. Di jiyane de tiştê ez herî pir jê nefret dikim, keçikeke sivik û erzan e.

DUNYAŞA: Ez mîna dînan bûme dildarê te. Tu miroveke ewqasî bi kultur î ku, tiştê tu nizanî tune ye! (Kurtebêdengiyek.)

YAŞA (Dibawîşke): Erê... Li gorî min çîrok weha ye: Ger keçikek dil têkeve yekî, tê wê maneyê ku ew ketiye rîyeke xerab. (Kurtebêdengiyek.) Çî xweş e mirov li derve puroyê bikişîne... (Guhdarî dike.) Hinek tîn. Koma giregiran e.

DUNYAŞA (Bi îhtiras wîhemêz dike.)

YAŞA: Ber bi mal ve here, mîna ku te xwe di çem de şuştibe û bi paş ve vedigerî, bike. Di vê şiveriyê de here da

40

DUNYAŞA (Bi şerm): Baş e. Wê çaxê pelerîne min ji min re bîne. Li ba garderbê ye. Vir hinekî bi rutûbet e.

YEPÎHODOV: Baş e, ez ê tavilê bînim. Min êdî fêhm kir ku

ez ê bi demança xwe çî bikim. (Radihîje gîtara
xwe, lê dixê û diçe.)

YAŞA: Bela! Di nava me de, ew gêjikek e. (Dibawişke.)

DUNYAŞA: Xwedê neke ew xwe nekuje. (Kurtebêdengiyek.)

Ez ewqasî aciz im ku ez her tim di hundurê
endîşeyekê de me. Gava wan ez anîme mala xanimjina
me, ez hê biçûk bûm, tabî ez niha ji wan
hemû tiştên basîd xelas bûme, destên min jî mîna
destên xanimekê spîboz e. Ez wilo hisî, wilo hesas
hatime mezinkirin ku ez ji her tiştî ditirsim. Di
hundurê min de her tim tirsek heye. Ger tu min
bixapînî, ez êdî nizanim bê wê sinirê min çawan
bibe.

YAŞA (Wê maçî dike): Ax, tu çî şekir î! Di gel vê, divê keçikek
qet xwe ji bîr neke. Di jiyanê de tiştê ez herî
pir jê nefret dikim, keçikeke sivik û erzan e.

DUNYAŞA: Ez mîna dînan bûme dildarê te. Tu miroveke
ewqasî bi kultur î ku, tiştê tu nizanî tune ye! (Kurtebêdengiyek.)

YAŞA (Dibawişke): Erê... Li gorî min çîrok weha ye: Ger
keçikek dil têkeve yekî, tê wê maneyê ku ew ketiye
riyeke xerab. (Kurtebêdengiyek.) Çî xweş e
mirov li derve puroyê bikişîne... (Guhdarî dike.)
Hinek tîn. Koma giregiran e.

DUNYAŞA (Bi îhtiras wîhemêz dike.)

YAŞA: Ber bi mal ve here, mîna ku te xwe di çem de şuştibe
û bi paş ve vedigerî, bike. Di vê şiveriyê de here da

40

ew te nebînî, an na wê bawer bikin me hevdu dî-

tiye. Ez nikarim tiştên wilo qebûl bikim.

DUNYAŞA (Hêdîka dikuxe): Puroya te serê min êşand. (Ji sehnê derdikeve.)

(Yaşa, li ba dêra biçûk rûdine û ranabe. Ranevskaya, Gayev û Lopahîn dikevin sehnê.)

LOPAHÎN: Divê tu biryara xwe bi bidî. Dem li bendî me ranaweste. Çîrok heta tu bibêjî basîd e. Hûn dixwazin ji bo havîngehan erdên xwe bidin bi kirê an na? Bi gotinekê bersiv bide: Erê, an na? Tenê bi gotinekê!

RANEVSKAYA: Evê ku li vir van puroyên kirêt dikişîne kî ye? (Rûdine.)

GAYEV: Piştî ku wan hesinrê li vir çêkirine ji me re çi rehet bûye. (Rûdine.) Em çûn bajêr, me xwarin xwar û em hatin, niha jî em li vir in. Min yek bi ya spî vekir! Min divê ez herim mal û bi partiyekê bileyizim.

RANEVSKAYA: Ecela wê tune ye.

LOPAHÎN: Tenê gotinekê! erê an na? (Mîna ku li ber digere.) Heydê, bersiv bide!

GAYEV (Dibawişke): Çawa?

RANEVSKAYA (Li hundurê çentê xwe yê peran dînihêre):

Hê do komek perê min hebû, lê niha hema hema qet nemaye. Varyakê tenê bi me xwarinên ji şîr dide xwarin û bi vî awayî dixwaze peran bide ser hev; herçî kal û pîrên li mitfaxê ne jî, ji bilî noka tiştêkî din nawxin, lê yê min ez rabûme û perên

41

ew te nebînin, an na wê bawer bikin me hevdu dî-

tiye. Ez nikarim tiştên wilo qebûl bikim.

DUNYAŞA (Hêdîka dikuxe): Puroya te serê min êşand. (Ji sehnê derdikeve.)

(Yaşa, li ba dêra biçûk rûdine û ranabe. Ranevskaya, Gayev û Lopahîn dikevin sehnê.)

LOPAHÎN: Divê tu biryara xwe bi bidî. Dem li bendî me ranaweste. Çîrok heta tu bibêjî basîd e. Hûn dixwazin ji bo havîngehan erdên xwe bidin bi kirê an na? Bi gotinekê bersiv bide: Erê, an na? Tenê bi gotinekê!

RANEVSKAYA: Evê ku li vir van puroyên kirêt dikişîne kî ye? (Rûdine.)

GAYEV: Piştî ku wan hesinrê li vir çêkirine ji me re çi rehet bûye. (Rûdine.) Em çûn bajêr, me xwarin xwar û em hatin, niha jî em li vir in. Min yek bi ya spî vekir! Min divê ez herim mal û bi partiyekê bileyizim.

RANEVSKAYA: Ecela wê tune ye.

LOPAHÎN: Tenê gotinekê! erê an na? (Mîna ku li ber digere.) Heydê, bersiv bide!

GAYEV (Dibawişke): Çawa?

RANEVSKAYA (Li hundurê çentê xwe yê peran dînihêre):

Hê do komek perê min hebû, lê niha hema hema qet nemaye. Varyakê tenê bi me xwarinên ji şîr dide xwarin û bi vî awayî dixwaze peran bide ser hev; herçî kal û pîrên li mitfaxê ne jî, ji bilî noka tiştêkî din nawxin, lê yê min ez rabûme û perên

41

xwe vir de û wê de davêjim. (Çentekê peran ji destan

dikeve, perên zêr li erdê belav dibin; bi ser Ranevskayayê de hêrs dibe.) Ev e, te hemû xist!

YAŞA: Destûr bide, ez bidim hev. (Peran dide hev.)

RANEVSKAYA: Ji qenciya xwe re, Yaşa! Gelo ji bo çi min çû li bajêr xwarin xwar? Ji restoranta te ya kirêt bi wê muzîka ne xweş, bi wan rûyên masan ku bîna sabûnê jê dihat, nefret dikim. Ji bo çi mirov ê evqasî pir vexwe Leonîd? Ji bo çi mirov ê evqasî pir bixwe? Ji bo çi mirov ê evqasî pir bipeyive? Tu îro dîsan li restaurantê pir peyivî, di derheqa tiştên ne di cih de. Li ser salên heftêyî, li ser şairên dekadanan. Û bi kê re? Rabe ji garsonan re li ser şairên dekadanan xeberdanan bike!

LOPAHÎN: Rast e.

GAYEV (Hereketeke destan dike): Ez islah nabim, ev vekirî ye... (Bi tewrekî hêrsbûyî ji Yaşa re.) Nizanim çi, ma tu ê her tim li ber pozê min bî?

YAŞA (Dikene): Gava ez dengê te dibihîzim, kenê min tê.

GAYEV (Ji Ranevskayayê re): An ew, an jî ez!

RANEVSKAYA: Heydê Yaşa, tu here, baz de.

YAŞA (Çentê Ranevskayayê didiyê): Zû. (Bi zorê kenê xwe dide rawestandî.) Tabilê, niha. (Derdikeve.)

LOPAHÎN: Cerîganovê dewlemend dixwaze malê we bikire. Dibêjin ku ew ê bi xwe were mazatê.

RANEVSKAYA: Te ev ji ku bihîst?

LOPAHÎN: Li bajêr gotin.

GAYEV: Xaltiya me ya li Yaroslavlayê soz daye ku wê tiştêkî bişîne; lê wê kengî bişîne, çawan bişîne ez nizanim.

xwe vir de û wê de davêjim. (Çentekê peran ji destan dikeve, perên zêr li erdê belav dibin; bi ser Ranevskayayê de hêrs dibe.) Ev e, te hemû xist!

YAŞA: Destûr bide, ez bidim hev. (Peran dide hev.)

RANEVSKAYA: Ji qenciya xwe re, Yaşa! Gelo ji bo çî min çû li bajêr xwarin xwar? Ji restoranta te ya kirêt bi wê muzîka ne xweş, bi wan rûyên masan ku bî-na sabûnê jê dihat, nefret dikim. Ji bo çî mirov ê evqasî pir vexwe Leonîd? Ji bo çî mirov ê evqasî pir bixwe? Ji bo çî mirov ê evqasî pir bipeyive? Tu îro dîsan li restorantê pir peyivî, di derheqa tiştên ne di cih de. Li ser salên heftêyî, li ser şairên dekadanan. Û bi kê re? Rabe ji garsonan re li ser şairên dekadanan xeberdanan bike!

LOPAHÎN: Rast e.

GAYEV (Hereketeke destan dike): Ez islah nabim, ev vekirî ye... (Bi tewrekî hêrsbûyî ji Yaşa re.) Nizanim çî, ma tu ê her tim li ber pozê min bî?

YAŞA (Dikene): Gava ez dengê te dibihîzim, kenê min tê.

GAYEV (Ji Ranevskayayê re): An ew, an jî ez!

RANEVSKAYA: Heydê Yaşa, tu here, baz de.

YAŞA (Çentê Ranevskayayê didiyê): Zû. (Bi zorê kenê xwe dide rawestandî.) Taviê, niha. (Derdikeve.)

LOPAHÎN: Cerîganovê dewlemend dixwaze malê we bikire. Dibêjin ku ew ê bi xwe were mazatê.

RANEVSKAYA: Te ev ji ku bihîst?

LOPAHÎN: Li bajêr gotin.

GAYEV: Xaltiya me ya li Yaroslavlayê soz daye ku wê tiştêkî bişîne; lê wê kengî bişîne, çawan bişîne ez nizanim.

42

LOPAHÎN: Gelo wê çiqasî bişîne? Sed hezarî? Du sed hezarî?

RANEVSKAYA: Na, na. Herî pir deh, panzdeh hezar. Divê em ji vê re jî spasdar bin.

LOPAHÎN: Bibuhure, lê min di jiyana xwe de yê mîna we, yê mîna we herduwan ku her tiştî sivik digirin, bêperwa, ku hişê wan nagihîje karan, nedîtine! Ez ji we re dibêjim wê mal û hebûna we bête firotin, lê qet ne xema we ye.

RANEVSKAYA: Baş e em çî bikin? Ka tu ji me re bibêje bê em ê çî bikin.

LOPAHIN: Ma ez her rojên Xwedê nabêjim? Ez her roj eynî tiştî ji we re dubare dikim. Divê hûn bexçê vîşne û perçeerdên din, ji bo havîngehan bidin bi kirê; hem jî divê hûn tavilê vê yekê bikin, dema mazatan hatiye! Fêhm bikin. Hema hûn biryara xwe ya di derheqa havîngehan de bidin, pereyên ku hûn bixwazin wê têkevin destên we û hûn ê xelas bibin.

RANEVSKAYA: Havîngeh û xwediyên wan, bibuhure, ew qet ne întresant in.

GAYEV: Ez bi te re di eynî fikrê de me.

LOPAHIN: Ez nizanim ne ez bigirîm ne bikenim. Ez dixwazim biqîrim, ber çavên min reş dibe, ez gêj dibim!

Na, ez hew dikanim debar bikim! Tu ê min dîn bikî!

(Ji Gayev re.) Tu mîna pîrejînan î!

GAYEV: Çii?

LOPAHÎN: Tu mîna pîrejinan î! (Dike biçe.)

RANEVSKAYA: (Bi tirs): Ax, çi dibe, meçe, dostê min ê ezîz! Belkî em li çareyekê bifirin.

43

LOPAHÎN: Gelo wê çiqasî bişîne? Sed hezarî? Du sed hezarî?

RANEVSKAYA: Na, na. Herî pir deh, panzdeh hezar. Divê em ji vê re jî spasdar bin.

LOPAHÎN: Bibuhure, lê min di jiyana xwe de yê mîna we, yê mîna we herduwan ku her tiştî sivik digirin, bêperwa, ku hişê wan nagihîje karan, nedîtine! Ez ji we re dibêjim wê mal û hebûna we bête firotin, lê qet ne xema we ye.

RANEVSKAYA: Baş e em çi bikin? Ka tu ji me re bibêje bê em ê çi bikin.

LOPAHIN: Ma ez her rojên Xwedê nabêjim? Ez her roj eynî tiştî ji we re dubare dikim. Divê hûn bexçê vîşne û perçerdên din, ji bo havîngehan bidin bi kirê; hem jî divê hûn tavilê vê yekê bikin, dema mazatan hatiye! Fêhm bikin. Hema hûn biryara xwe ya di derheqa havîngehan de bidin, pereyên ku hûn bixwazin wê têkevin destên we û hûn ê xelas bibin.

RANEVSKAYA: Havîngeh û xwediyên wan, bibuhure, ew qet ne întresant in.

GAYEV: Ez bi te re di eynî fikrê de me.

LOPAHIN: Ez nizamim ne ez bigirîm ne bikenim. Ez dixwazim biqîrim, ber çavên min reş dibe, ez gêj dibim!

Na, ez hew dikanim debar bikim! Tu ê min dîn bikî!
(Ji Gayev re.) Tu mîna pîrejinan î!

GAYEV: Çii?

LOPAHÎN: Tu mîna pîrejinan î! (Dike biçe.)

RANEVSKAYA: (Bi tirs): Ax, çi dibe, meçe, dostê min ê ezîz! Belkî em li çareyekê bifirin.

43

LOPAHÎN: Tişteki ku lê bête fikirandin tune ye!

RANEVSKAYA: Çi dibe meçe, ez tika dikim. Gava tu li vir bî, kêfa min jî li cih e. (Kurtebêdengiyek.) Hîseke mîna wê tiştin bibe, di hundurê min de heye, mîna wê xanî bi ser me de hilweşe.

GAYEV (Mîna ku di nava ftkrên kûr de be): Min yek li ya spî xist! Duplek jî li topên ortê.

RANEVSKAYA: Gunehên me yên mezin hebûne!

LOPAHEN: Gunehên we! Ma wê çi gunehên we hebin?

GAYEV (Şekireki davêje devê xwe): Dibêjin min hemû serweta xwe daye bi şekir. (Dikene.)

RANEVSKAYA: Ax, gunehên min kirine bi hejmartinê xelas nabin! Min hemû pereyên xwe vir de û wê de xerc kirin, mîna dînan; ez bi zilameki ku her tim deynan dike re zewicîm. Mêrê min ji şampanyayê miriye, wî ecêb vedixwar. Paşê, di demeke xwe ya bêşans de, ez dil ketim yekî din û çûme ba wî. Tam di wê demê de, bela pêşî hate serê min-darbeyeke giran bû...a li vir, di vî çemî de lawê min xeniqî; ez jî bi niyeta ku hew vegerim, hew vî çemî bibînim, min lêxist ez çûme derveyî welêt. Min çavên

xwe girtin û bi koranî çûm. Lê wî zilamî dev ji min berneda, wî bi înad da dû min. Bi bêmerhemetî da dû şopa min. Ji ber ku ew li Mentonê nexweş ket, min li nêzîkî wir vîlayek kirî û sê salan rehetî nedît. Wî bi wê rewşa xwe ya nexweş tiştên nemayî anîn serê min, bi nexweşiya xwe mala min viritand. Dawiyê, gava ji bo deynan vîlaya min hate firotin, min bar kir Parîsê, wî li wir jî çiyê min hebû ji min stand, bera dû jinekê da û 44

LOPAHÎN: Tişteki ku lê bête fikirandin tune ye!

RANEVSKAYA: Çi dibe meçe, ez tika dikim. Gava tu li vir bî, kêfa min jî li cih e. (Kurtebêdengiyek.) Hîseke mîna wê tiştin bibe, di hundurê min de heye, mîna wê xanî bi ser me de hilweşe.

GAYEV (Mîna ku di nava ftkrên kûr de be): Min yek li ya spî xist! Duplek jî li topên ortê.

RANEVSKAYA: Gunehên me yên mezin hebûne!

LOPAHEN: Gunehên we! Ma wê çi gunehên we hebin?

GAYEV (Şekirekî davêje devê xwe): Dibêjin min hemû serweta xwe daye bi şekir. (Dikene.)

RANEVSKAYA: Ax, gunehên min kirine bi hejmartinê xelas nabin! Min hemû pereyên xwe vir de û wê de xerc kirin, mîna dînan; ez bi zilamekî ku her tim deynan dike re zewicîm. Mêrê min ji şampanyayê miriye, wî ecêb vedixwar. Paşê, di demeke xwe ya bêşans de, ez dil ketim yekî din û çûme ba wî.

Tam di wê demê de, bela pêşî hate serê min-darbeyeke

giran bû...a li vir, di vî çemî de lawê min xeniqî;
ez jî bi niyeta ku hew vegerim, hew vî çemî
bibînim, min lêxist ez çûme derveyê welêt. Min çavên
xwe girtin û bi koranê çûm. Lê wî zilamê dev ji
min berneda, wî bi înad da dû min. Bi bêmerhemetî
da dû şopa min. Ji ber ku ew li Mentonê
nexweş ket, min li nêzîkî wir vîlayek kirî û sê salan
rehetî nedît. Wî bi wê rewşa xwe ya nexweş
tiştên nemayî anîn serê min, bi nexweşiya xwe
mala min viritand. Dawiyê, gava ji bo deynan vî-
laya min hate firotin, min bar kir Parîsê, wî li wir
jî çiyê min hebû ji min stand, bera dû jinekê da û
44

ez bi tenê hiştim. Hingî min jehr vexwar û xwest
ku xwe bikujim. Ev hemû tiştên kirêt in, rûreşî ye!
Di wê navê de xwesteka vegera Rûsyayê bi min re
çêbû, vegera welêt, ba keçika xwe... (Hêsirên xwe
pakij dike.) Xwedêyo, bila gunehê te bi min bê,
min efû bike, min hê bêtir ceze neke! (Telegrafekê
ji bêrîka xwe derdixe) Ev îro ji Parîsê ji min re hatiye.
Ew dixwaze ez wî efû bikim, li ber min digere
ku ez dîsan vegerim Parîsê. (Telegrafê diçirîne.)
Gelo ev ne dengê muzîkê ye? (Guhdarî dike.)

GAYEV: Ev orkestraya cihûyê me ya navdar e. Tê bîra te?
Çar keman, flutek û du basso bû.

RANEVSKAYA: Ew orkestra hê jî heye? Me rojekê bang
wan bikira û baloyek çêbikira.

LOPAHÎN (Guhdarî dike): Ez tiştêkî nabihîzim... (Stranek

hêdî tê gotin.)

"Peran bide, ew alman,

rûsan dikin fransiz."

(Dikene.) Min êvara çû li tiyatroyê piyeseke gelekî

komîk dît; ecêb komîk!

RANEVSKAYA: Belkî qet jî ne komîk bû. Ji berdêla tu li lîstikan

temaşê bikî, te li xwe binihêriya û bidîta bê

tu çî jiyaneke vemirî dijî; te bidîta bê gotinên te çiqasî

bêmane ne.

LOPAHÎN: Rast e. Ez ji dil dibêjim ku em mîna dînan dijîn.

(Kurtebêdengiyek.) Bavê min gundiyek bû, gundiyekî

ku aqilê wî nedigihîşt tiştêkî û tiştêkî fêrî min

nekir. Tiştê wî dizanîbû, gava vedixwar, radihişt

45

ez bi tenê hiştim. Hingî min jehr vexwar û xwest

ku xwe bikujim. Ev hemû tiştên kirêt in, rûreşî ye!

Di wê navê de xwesteka vegera Rûsyayê bi min re

çêbû, vegera welêt, ba keçika xwe... (Hêsirên xwe

pakij dike.) Xwedêyo, bila gunehê te bi min bê,

min efû bike, min hê bêtir ceze neke! (Telegrafekê

ji bêrîka xwe derdixe) Ev îro ji Parîsê ji min re hatiye.

Ew dixwaze ez wî efû bikim, li ber min digere

ku ez dîsan vegerim Parîsê. (Telegrafê diçirîne.)

Gelo ev ne dengê muzîkê ye? (Guhdarî dike.)

GAYEV: Ev orkestraya cihûyê me ya navdar e. Tê bîra te?

Çar keman, flutêk û du basso bû.

RANEVSKAYA: Ew orkestra hê jî heye? Me rojekê bang

wan bikira û baloyek çêbikira.

LOPAHÎN (Guhdarî dike): Ez tişteki nabihîzim... (Stranek hêdî tê gotin.)

"Peran bide, ew alman, rûsan dikin fransiz."

(Dikene.) Min êvara çû li tiyatroyê piyeseke gelekî komîk dît; ecêb komîk!

RANEVSKAYA: Belkî qet jî ne komîk bû. Ji berdêla tu li lîstikan temaşe bikî, te li xwe binihêriya û bidîta bê tu çî jiyaneke vemirî dijî; te bidîta bê gotinên te çiqasî bêmane ne.

LOPAHÎN: Rast e. Ez ji dil dibêjim ku em mîna dînan dijîn. (Kurtebêdengiyek.) Bavê min gundiyek bû, gundiyeke ku aqilê wî nedigihîşt tişteki û tişteki fêrî min nekir. Tiştê wî dizanîbû, gava vedixwar, radihişt

45

dareki û pê li min dixist. Tu ya rastî bixwazî, di dînbûn û bêaqilîyê de ez jî ne kêmi wî me. Perwerdeyeke min a bi rêk û pêk tune, destnivîsa min ne xweşik e; bi qasî ku mirov ji ber şerm bike, kirête.

RANEVSKAYA: Divê tu bizewicî, dostê min.

LOPAHÎN: Erê, raste.

RANEVSKAYA: Çima tu bi Varyaya me re nazewicî? Keçikeke pir baş e.

LOPAHÎN: Rast e.

RANEVSKAYA: Keçikeke dilpak î baş e; ji sibehê hetanî êvarê dixebite, ji te jî hez dike. Ji berê ve kêfa te jî ji wê re tê.

LOPAHÎN: Çima nebe? Ji serê min zêde ye. Keçikeke pir

baş e. (Kurtebêdengiyek.)

GAYEV: Di bankayekê de karek pêşniyazî min kiriye. Salê şeş hezar ruble. Ma te ev bihîstibû?

RANEVSKAYA: Tu, li bankê! Li cihê xwe rûne.

(Fîrs, paltoyekî tîne.)

FÎRS (Ji Gayev re): Kerem bike vî li xwe ke, sar e.

GAYEV (Palto li xwe dike). Fîrs, tu êdî bêhna mirov teng dikî!

FÎRS: Wilo nabe, ezbenî, tu bêî xebera min derdikevî derve.

(Ser û binê Gayev kontrol dike.)

RANEVSKAYA: Tu çiqasî kal bûyî, Fîrs!

FÎRS: Te çi kerem kir, ezbenî?

LOPAHÎN: Dibêje bê tu çiqasî kal bûyî!

FÎRS: Ez pir jiyame. Gava ji min re yek dîtibûn, hê bavê te

46

darekî û pê li min dixist. Tu ya rastî bixwazî, di dînbûn û bêaqilîyê de ez jî ne kêrî wî me. Perwerdeyêke min a bi rêk û pêk tune, destnivîsa min ne xweşik e; bi qasî ku mirov ji ber şerm bike, kirête.

RANEVSKAYA: Divê tu bizewicî, dostê min.

LOPAHÎN: Erê, raste.

RANEVSKAYA: Çima tu bi Varyaya me re nazewicî? Keçikeke pir baş e.

LOPAHÎN: Rast e.

RANEVSKAYA: Keçikeke dilpak î baş e; ji sibehê hetanî êvarê dixebite, ji te jî hez dike. Ji berê ve kêfa te jî ji wê re tê.

LOPAHÎN: Çima nebe? Ji serê min zêde ye. Keçikeke pir

baş e. (Kurtebêdengiyek.)

GAYEV: Di bankayekê de karek pêşniyazê min kiriye. Salê şeş hezar ruble. Ma te ev bihîstibû?

RANEVSKAYA: Tu, li bankê! Li cihê xwe rûne.

(Fîrs, paltoyekî tîne.)

FÎRS (Ji Gayev re): Kerem bike vî li xwe ke, sar e.

GAYEV (Palto li xwe dike). Fîrs, tu êdî bêhna mirov teng dikî!

FÎRS: Wilo nabe, ezbenî, tu bêî xebera min derdikevî derve.

(Ser û binê Gayev kontrol dike.)

RANEVSKAYA: Tu çiqasî kal bûyî, Fîrs!

FÎRS: Te çi kerem kir, ezbenî?

LOPAHÎN: Dibêje bê tu çiqasî kal bûyî!

FÎRS: Ez pir jiyame. Gava ji min re yek dîtibûn, hê bavê te

46

nehatibû dinyayê. (Dikene.) Gava azadî dane

koleyan ez bûm serxulam. Lê min azadî filan nexwestibû;

ez li ba mîrzayê xwe mam. (Kurtebêdengiyek.)

Tê bîra min hemû pir kêfxweş bûbûn, lê

kesî nizanîbûn bê ji bo çi ew kêfxweş bûne.

LOPAHÎN: Berê pir baş bû. Qet nebe wan deman qamçî hebûn.

FÎRS: (Tiştên wî gotibûn baş fêhm nekiribû): Ee, wilo bû!

Berê gundiyan bi gundîtiya xwe dizanîbûn û axan

jî bi axatiya xwe, lê belê niha her tişt tevlî hev bû-

ye. Ne mumkun e mirov bikaribe tişteki fêhm bike.

GAYEV: Devê xwe bigire, Fîrs. Ez ê sibehê dîsan herim bajêr.

Wê min bi generalekî ku bi sened deynan dide

re, bidin naskirin, soz dane min.

LOPAHIN: Alîkarî nake. Bawer bike tu ê nikanibî faîza wê jî bidî.

RANEVSKAYA (Ji Lopahîn re): Bêaqiliya wî ye, general meneral li navê nîn in.

(Trofîmov, Anya û Varya dikevin sehnê.)

GAYEV: Va ye keçikên me tîn.

ANYA: Wa ye diya min li wir e.

RANEVSKAYA (Bi hezkirin): Werin, werin zarokên min.

(Anya û Varya hemêz dike.) Hûn nizanin bê ez çiqasî

ji we herdiwan hez dikim! Ka li teniştta min

rûnên, ha wilo. (Hemû rûdinên.)

LOPAHÎN: Xwendevanê me yê ebedî her tim bi keçikan re digere.

47

nehatibû dinyayê. (Dikene.) Gava azadî dane

koleyan ez bûm serxulam. Lê min azadî filan nexwestibû;

ez li ba mîrzayê xwe mam. (Kurtebêdengiyek.)

Tê bîra min hemû pir kêfxweş bûbûn, lê

kesî nizanîbûn bê ji bo çi ew kêfxweş bûne.

LOPAHÎN: Berê pir baş bû. Qet nebe wan deman qamçî hebûn.

FÎRS: (Tiştên wî gotibûn baş fêhm nekiribû): Ee, wilo bû!

Berê gundiyan bi gundîtiya xwe dizanîbûn û axan

jî bi axatiya xwe, lê belê niha her tişt tevî hev bû-

ye. Ne mumkun e mirov bikaribe tişteki fêhm bike.

GAYEV: Devê xwe bigire, Fîrs. Ez ê sibehê dîsan herim bajêr.

Wê min bi generalekî ku bi sened deynan dide

re, bidin naskirin, soz dane min.

LOPAHIN: Alîkarî nake. Bawer bike tu ê nikanibî faîza wê

jî bidî.

RANEVSKAYA (Ji Lopahîn re): Bêaqiliya wî ye, general meneral li navê nîn in.

(Trofîmov, Anya û Varya dikevin sehnê.)

GAYEV: Va ye keçikên me tên.

ANYA: Wa ye diya min li wir e.

RANEVSKAYA (Bi hezkirin): Werin, werin zarokên min.

(Anya û Varya hemêz dike.) Hûn nizanin bê ez çiqasî

ji we herdiwan hez dikim! Ka li teniştta min

rûnên, ha wilo. (Hemû rûdinên.)

LOPAHÎN: Xwendevanê me yê ebedî her tim bi keçikan re digere.

47

TROFÎMOV: Tu li karê xwe binihêre.

LOPAHIN: Bûye pêncî salî, lê hê jî xwendevan e.

TROFIMOV: Dev ji van henekên xwe yên dînîtî berde.

LOPAHÎN: Tu çima hêrs dibî?

TROFIMOV: Tu çima bela xwe di min didî.

LOPAHÎN: (Dikene.) Min dixwest ez bizanibim bê tu di derheqa min de çi difikirî.

TROFIMOV: Ez di derheqa te de van difikirim, Yermolay.

Tu dewlemend î, tu ê di nêzîk de bibî milyoner.

Çawan heywanekî hov, ji bo denga xwezayê pê-

wîst be, tu jî eynî wilo pêwîst î.

(Hemû dikenin.)

VARYA: Ya baş ew e tu ji me re qala stêrkan bikî, Petya.

RANEVSKAYA: Na, em peyva xwe ji cihê ku ji do ve mabû dom bikin.

TROFÎMOV: Di derheqa çi de bû.

GAYEV: Di derheqa gûrûrê de bû.

TROFIMO: Em do dûr û dirêj peyivîn, lê em negihîştin cihekî.

Bi celebê bikaranîna te ya gotinê, di gûrûrê de hêleke mîstik heye. Di tenga xwe de tu dikarî biheq bî, lê gava li hêla meselê ya basîd bête nihêrîn, çi pêwîstiya gûrûrê heye? Piştî ku mirov bi ruhî evqasî reben be, piraniya me ewqasî hov bin, ewqasî dîn û ne dilşa bin, çi mana gûrûrê heye? Divê em dev ji vê heyrantiya xwe bi xwe berdin. Tişteke heye divê bête kirin, ew jî xebat e.

GAYEV: Dawî dawî em ê hemû bimirin.

TROFÎMOV: Kî zane? Hem, mirin tê çi manê? Dibe ku sed
48

TROFÎMOV: Tu li karê xwe binihêre.

LOPAHIN: Bûye pêncî salî, lê hê jî xwendevan e.

TROFIMO: Dev ji van henekên xwe yên dînîtî berde.

LOPAHÎN: Tu çima hêrs dibî?

TROFIMO: Tu çima bela xwe di min didî.

LOPAHÎN: (Dikene.) Min dixwest ez bizanibim bê tu di derheqa min de çi difikirî.

TROFIMO: Ez di derheqa te de van difikirim, Yermolay.

Tu dewlemend î, tu ê di nêzîk de bibî milyoner.

Çawan heywanekî hov, ji bo denga xwezayê pêwîst be, tu jî eynî wilo pêwîst î.

(Hemû dikenin.)

VARYA: Ya baş ew e tu ji me re qala stêrkan bikî, Petya.

RANEVSKAYA: Na, em peyva xwe ji cihê ku ji do ve mabû

dom bikin.

TROFÎMOV: Di derheqa çi de bû.

GAYEV: Di derheqa gûrûrê de bû.

TROFIMO: Em do dûr û dirêj peyivîn, lê em negihîştin cihekî.

Bi celebê bikaranîna te ya gotinê, di gûrûrê de hêleke mîstik heye. Di tenga xwe de tu dikarî biheq bî, lê gava li hêla meselê ya basîd bête nihêrîn, çi pêwîstiya gûrûrê heye? Piştî ku mirov bi ruhî evqasî reben be, piraniya me ewqasî hov bin, ewqasî dîn û ne dilşa bin, çi mana gûrûrê heye? Divê em dev ji vê heyrantiya xwe bi xwe berdin. Tiştêk heye divê bête kirin, ew jî xebat e.

GAYEV: Dawî dawî em ê hemû bimirin.

TROFÎMOV: Kî zane? Hem, mirin tê çi manê? Dibe ku sed

48

hesên mirovî hebe, gava dimire, tenê pênc hesên em pê dizanin, dimirin, lê nod û pênc hes jî sax dimînin.

RANEVSKAYA: Tu çi bîaqil î, Petya.

LOPAHÎN (Bi tinaz): Bêhawe!

TROFÎMOV: Mirov xwe mukemel dîkin û her bi pêş ve diçin. Tiştên em niha nagihîjinê, em ê rojek ji rojan bi dest bixin, wê ji me re eşkere û vekirî bibin. Lê divê em jî bixebitin, alîkariya ku ji me bê divê em bi lêgerên rastiye bikin. Îro li Rûsyayê kê mîrov dixebitin. Piraniya mirovên xwende ku ez nas dikim, ne xwediye tu meraqan in, ne tu karî dîkin, ne jî heta niha tiştêk kirine. Navê "întelektuelan" li xwe dîkin, lê li hemberî xulaman hovane tevdigerin,

muamela heywanan bi gundiyan dikin, tiş-
tekî fêr nabin, tişteki cidî naxwînin, tişteki nakin,
bê ku bizanibin behsa tiştan dikin, çî bigire ji huner
tişteki fêhm nakin. Hemû sergiran in, rûyê
wan cidî ne, mijarên girîng munaqeşe dikin, qaşo
felsefê dikin; ji aliyê din ve jî -ji sedî nod û nehê
me- mîna hovan dijîn, ji bo tişteki herî biçûk bi
gurmistan bi hev dikevin, çêran ji hev re dikin, em
mîna berazan dixwin, li cihên mîna axuran radizên,
ji kêç, sipî, genîtî û bêexlaqiyê mirov nikane
gava xwe bavêje. Pir xuyaye armanca hemû gotinên
me ew e ku em hem xwe, hem jî yê li hemberî
xwe teselî bikin. Ka zarokxaneya ku ewqasî li ser
tête peyivandin nîşanî min bidin, odayên xwendinê
nîşanî min bidin. Evên ha tenê di romanên de
mane, di jiyana rastîn de tişteki ji van tune. Di
49

hesên mirovî hebe, gava dimire, tenê pênc hesên
em pê dizanin, dimirin, lê nod û pênc hes jî sax dimînin.

RANEVSKAYA: Tu çî bîaqil î, Petya.

LOPAHÎN (Bi tinaz): Bêhawe!

TROFÎMOV: Mirov xwe mukemel dikin û her bi pêş ve di-
çin. Tiştên em niha nagihîjinê, em ê rojek ji rojan
bi dest bixin, wê ji me re eşkere û vekirî bibin. Lê
divê em jî bixebitin, alîkariya ku ji me bê divê em
bi lêgerên rastiyê bikin. îro li Rûsyayê kê mîrov
dixebitin. Piraniya mirovên xwende ku ez nas dikim,
ne xwediyê tu meraqan in, ne tu karî dikin,

ne jî heta niha tiştekirine. Navê "întelektuelan"
li xwe dikin, lê li hemberî xulaman hovane tevdigerin,
muamela heywanan bi gundiyan dikin, tiş-
tekî fêr nabin, tiştekirî cidî naxwînin, tiştekirî nakin,
bê ku bizanibin behsa tiştan dikin, çî bigire ji huner
tiştekirî fêhm nakin. Hemû sergiran in, rûyê
wan cidî ne, mijarên girîng munaqêşe dikin, qaşo
felsefê dikin; ji aliyê din ve jî -ji sedî nod û nehê
me- mîna hovan dijîn, ji bo tiştekirî herî biçûk bi
gurmistan bi hev dikevin, çêran ji hev re dikin, em
mîna berazan dixwin, li cihên mîna axuran radizên,
ji kêç, sipî, genîtî û bêexlaqiyê mirov nikane
gava xwe bavêje. Pir xuyaye armanca hemû gotinên
me ew e ku em hem xwe, hem jî yê li hemberî
xwe teselî bikin. Ka zarokxaneyê ku ewqasî li ser
tête peyivandin nîşanî min bidin, odayên xwendinê
nîşanî min bidin. Evên ha tenê di romanên de
mane, di jiyana rastîn de tiştekirî ji van tune. Di
49

eslê xwe de ji pîsîtiyê û ji guhnedariya asyayî pê ve
ne tiştekirî din e. Ez ji rûyên wilo cidî hem ditirsim,
hem jî nefret dikim. Ez ji sohbetên cidî nefret dikim.
Ger em qet devê xwe venekin û nepeyivin wê
hê baştir be.

LOPAHEN: Binêre, ez sibehan şefaqaqan radibim û hetanî êvaran
dixebitim; mîna perê min, pereyên yê din jî
di ber destên min re derbas dibin, bi xêra vê yekê
ez têdigihêm mirovên li der û dora min çî mal in.

Ji bo ku mirov fêr bibe bê mirovên pêbawer û pakij
çiqas hindikin, hema mirov weha nêzîkî kar bibe
bes e. Bi şevan, gava ez çavvekirî xwe dirêj dikim,
ez xwe bi xwe dibêjim: "Xwedêyo te daristanên
muezem, erdên bêsînor, asoyên fireh daye me,
diviyabû em yên li vir dijîn jî weke hûtan bûna."

RANEVSKAYA: Tu hûtan dixwazî! Tu gotineke min ji hû-
tên çîrokan re tune ye, lê di jiyana rastîn de ew
xelkê ditirsînin. (Yepîhodov di pişt sehnê re li gîtara
xwe dixe û derbas dibe.) Yepîhodov derbas dibe.

ANYA (Difikire): Yepîhodov derbas dibe.

GAYEV: Roj çû ava.

TROFÎMOV: Erê.

GAYEV: (Bi dengê nizim mîna ku helbestan dixwîne.) Ey
xweza, xwezaya pîroz, xwezaya ku bi nûra nemir
dibiriqe; tu hem spehî yî, hem jî guhnedêr î, tu dayika
me yî; ya ku hem jiyanê, hem jî mirinê di
xwe de dicîvîne tu yî; ya ku can dide û can distîne
tu yî...

VARYA (Bi dengê libergerîn): Xalo!

50

eslê xwe de ji pîsîtî û ji guhnedariya asyayî pê ve
ne tişteki din e. Ez ji rûyên wilo cidî hem ditirsim,
hem jî nefret dikim. Ez ji sohbetên cidî nefret dikim.
Ger em qet devê xwe venekin û nepeyivin wê
hê baştir be.

LOPAHEN: Binêre, ez sibehan şefaqaqan radibim û hetanî êvaran
dixebitim; mîna perê min, pereyên yên din jî

di ber destên min re derbas dibin, bi xêra vê yekê ez têdigihêm mirovên li der û dora min çî mal in. Ji bo ku mirov fêr bibe bê mirovên pêbawer û pakij çiqas hindikin, hema mirov weha nêzîkî kar bibe bes e. Bi şevan, gava ez çavvekirî xwe dirêj dikim, ez xwe bi xwe dibêjim: "Xwedêyo te daristanên muezem, erdên bêsînor, asoyên fireh daye me, diviyabû em yên li vir dijîn jî weke hûtan bûna."

RANEVSKAYA: Tu hûtan dixwazî! Tu gotineke min ji hûtên çîrokan re tune ye, lê di jiyana rastîn de ew xelkê ditirsînin. (Yepîhodov di pişt sehnê re li gîtara xwe dixê û derbas dibe.) Yepîhodov derbas dibe.

ANYA (Difikire): Yepîhodov derbas dibe.

GAYEV: Roj çû ava.

TROFÎMOV: Erê.

GAYEV: (Bi dengê nizim mîna ku helbestan dixwîne.) Ey xweza, xwezaya pîroz, xwezaya ku bi nûra nemir dibiriqê; tu hem spehî yî, hem jî guhnedêr î, tu dayika me yî; ya ku hem jiyanê, hem jî mirinê di xwe de dicîvîne tu yî; ya ku can dide û can distîne tu yî...

VARYA (Bi dengê libergerîn): Xalo!

50

ANYA: Binêr, te dîsan dest pê kir, xalo!

TROFÎMOV: Ya baş ew e tu li topa sor bixî.

GAYEV: Ez devê xwe digirim, devê xwe digirim!

(Hemû rûniştine û diftkirin. Bêdengiyeke ku tenê carinan bi piste pista Fîrsê kal xerab dibe heye. Ji

nişkê ve, ji dûr ve, dengekî mîna qetandina têleke
tembûrê mîna ku ji asmana were, tête bihîstin. Ew
deng bi hizin kê m dibe, kê m dibe û wenda dibe.)

RANEVSKAYA: Evçibû?

LOPAHÎN: Nizanim. Dibe li dûr, di madenekê de satileke
ku bi dolabê ve girêdayî xelas bûbe. Lê herhehal
wê li gelekî dûr bûbe.

GAYEV: Dibe ku çûkek be, çûkekî masîxwir.

TROFÎMOV: An jî kundek.

RANEVSKAYA: (Vedicimqe): Di vê de tabuyek heye. (Kurtebêdengiyek.)

FIRS: Berî wê bobelata mezin jî eynî tişt bû; kund xwendibû,
semawer fişiya bû.

GAYEV: Kîjan bobelata mezin?

FÎRS: Azadî. (Kurtebêdengiyek.)

RANEVSKAYA: Heydê, dostên min, em êdî herin, dereng e.
(Ji Anyayê re.) Çavên te bi hêsin in. Çi bû ye cana
min? (Anyayê hemêz dike.)

ANYA: Tişteke nebûye, yadê, tişt nebûye.

TROFÎMOV: Yek tê.

(Rêwiyekî ku şevqakî nêçîrvanan î kevin li serîye
û paltoyek li nava milan e, xuya dibe. Kêfa rêwî li

51

ANYA: Binêr, te dîsan dest pê kir, xalo!

TROFÎMOV: Ya baş ew e tu li topa sor bixî.

GAYEV: Ez devê xwe digirim, devê xwe digirim!

(Hemû rûniştine û diftkirin. Bêdengiyekê ku tenê
carinan bi piste pista Fîrsê kal xerab dibe heye. Ji
nişkê ve, ji dûr ve, dengekî mîna qetandina têleke

tembûrê mîna ku ji asmana were, tête bihîstin. Ew deng bi hizin kê m dibe, kê m dibe û wenda dibe.)

RANEVSKAYA: Evçibû?

LOPAHÎN: Nizanim. Dibe li dûr, di madenekê de satileke ku bi dolabê ve girêdayî xelas bûbe. Lê herhehal wê li gelekî dûr bûbe.

GAYEV: Dibe ku çûkek be, çûkekî masîxwir.

TROFÎMOV: An jî kundek.

RANEVSKAYA: (Vedicimqe): Di vê de tabuyek heye. (Kurtebêdengiyek.)

FIRS: Berî wê bobelata mezin jî eynî tişt bû; kund xwendibû, semawer fişiya bû.

GAYEV: Kîjan bobelata mezin?

FÎRS: Azadî. (Kurtebêdengiyek.)

RANEVSKAYA: Heydê, dostên min, em êdî herin, dereng e.

(Ji Anyayê re.) Çavên te bi hêsir in. Çi bû ye cana min? (Anyayê hemêz dike.)

ANYA: Tişteke nebûye, yadê, tişt nebûye.

TROFÎMOV: Yek tê.

(Rêwiyekî ku şevqakî nêçîrvanan î kevin li serîye û paltoyek li nava milan e, xuya dibe. Kêfa rêwî li

51

cih e.)

RÊWÎ: Bibuhure, gelo ev rê diçe stasyonê?

GAYEV: Erê, diçiyê.

RÊWÎ: Gelek spas. (Hêdîka dikuxe.) Hewa jî gelekî xweş e. (Bi hereketên xwe mîna ku helbestan bixwîne.)

Birayê min, hey birayê min î êşkêş... Were Volgaya ku dinale... (Ji Varyayê re.) Matmazel, ji kerema

xwe re çend kopekan bide hevvelatîyê xwe.

(Varyaji tirsan diqîre.)

LOPAHÎN (Bi hêrs): Her tişt û sînorekî wê heye!

RANEVSKAYA (Şaş bûye): Ha ji te re, bigire. (Cûzdanê xwe yê peran tev dide.) Qet zîv bi min re tune yc.Xem nake, ha ji te re rubleyeke zêr.

RÊWÎ: Heta tu bêjî ez spasdarê te me, xanim. (Diçe. Dengê kenê wî tê bihîstin.)

VARYA (Bi tirs): Divê ez herim! Va ye ez diherim! Ax, dayê, pariyek nan tune ye ku xelkê malê bixwin, tu radibî rubleyekê didî zilêm.

RANEVSKAYA: Ma mirov li bendî dayika min a gêjik û çiyê? Ka em herin malê, çî li malê hebe ez ê hemûyî bidime te. Yermolay, tu hinek perên din jî bi deyn nadîmin?

LOPAHÎN: Ser çavan.

RANEVSKAYA: Hemû werin, em herin, wexta çûnê hatiye. Varyaka min, me di vê navê de karê zewaca te jî hal kir. Pîroz be.

VARYA (Girî dikeve qirikê): Yadê, ev ne tiştêkî ku bibe mi-52
cih e.)

RÊWÎ: Bibuhure, gelo ev rê diçe stasyonê?

GAYEV: Erê, diçiyê.

RÊWÎ: Gelek spas. (Hêdîka dikuxe.) Hewa jî gelekî xweş e. (Bi hereketên xwe mîna ku helbestan bixwîne.)

Birayê min, hey birayê min î êşkêş... Were Volgaya ku dinale... (Ji Varyayê re.) Matmazel, ji kerema

xwe re çend kopekan bide hevvelatîyê xwe.

(Varyaji tirsan diqîre.)

LOPAHÎN (Bi hêrs): Her tişt û sînorekî wê heye!

RANEVSKAYA (Şaş bûye): Ha ji te re, bigire. (Cûzdanê xwe yê peran tev dide.) Qet zîv bi min re tune yc.Xem nake, ha ji te re rubleyeke zêr.

RÊWÎ: Heta tu bêjî ez spasdarê te me, xanim. (Diçe. Dengê kenê wî tê bihîstin.)

VARYA (Bi tirs): Divê ez herim! Va ye ez diherim! Ax, dayê, pariyek nan tune ye ku xelkê malê bixwin, tu radibî rubleyekê didî zilêm.

RANEVSKAYA: Ma mirov li bendî dayika min a gêjik û çiyê? Ka em herin malê, çî li malê hebe ez ê hemûyî bidime te. Yermolay, tu hinek perên din jî bi deyn nadîmin?

LOPAHÎN: Ser çavan.

RANEVSKAYA: Hemû werin, em herin, wexta çûnê hatiye. Varyaka min, me di vê navê de karê zewaca te jî hal kir. Pîroz be.

VARYA (Girî dikeve qirikê): Yadê, ev ne tişteki ku bibe mi-
52

jara tinazan.

LOPAHÎN: Here manastirekê!

GAYEV: Destên min dilerizin; ji mêj ve ye min bi bîlardo nelîstiye.

LOPAHIN: De heydê werin, wextê xwarinê ye.

VARYA: Mêrik çawan ziravê min qetand! Dilê min hê jî lê-dixe.

LOPAHIN: Bi destûra te be, ez dixwazim di bîra te de bî-

nim ku wê bexçê vîşne di bîst û dudê tebaxê de derkeve firotinê. Ji bîr neke, ha!

(Ji bilî Trofîmov û Anya hemû diçin.)

ANYA (Dikene): Çi baş bû ku wî Varya tirsand; em ji xwe re bi tenê man.

TROFÎMOV: Ji ber Varya ditirse ku em ê dil têkevin hev, bi rojan e ew me bi tenê nahêle. Ji ber tengfikirîna xwe, ew nizane ku em bi ser evînê ketine. Hemû mane û armanca jiyana me ew e ku em ji her tiştên nerast, ji her tiştên me ji azadî û dilşahiya me bêpar dihêle, birevin! Em ber bi pêş ve diçin! Em bêî ku tu astengiyan nas bikin, ber bi wê stêrka dûr ku diçûrise, diçin! Ber bi pêş! Li dû nemînin, hevalno!

ANYA (Destê xwe li hev dixê): Tu çi qasî xweş dipeyivî! (Kurtebêdengiyek.) Îro vir bêhawe xweş bû, ne wilo?

TROFÎMOV: Hewayek xweş e.

ANYA: Te çi bi min kir, Petya? Ji bo çi ez mîna berê ji bexçê vîşne hez nakim? Min ewqasî ji bexçê vîşne hez

53

jara tinazan.

LOPAHÎN: Here manastirekê!

GAYEV: Destên min dilerizin; ji mêj ve ye min bi bîlardo nelîstiyê.

LOPAHIN: De heydê werin, wextê xwarinê ye.

VARYA: Mêrik çawan ziravê min qetand! Dilê min hê jê lêdixê.

LOPAHIN: Bi destûra te be, ez dixwazim di bîra te de bî-

nim ku wê bexçê vîşne di bîst û dudê tebaxê de derkeve firotinê. Ji bîr neke, ha!

(Ji bilî Trofîmov û Anya hemû diçin.)

ANYA (Dikene): Çi baş bû ku wî Varya tirsand; em ji xwe re bi tenê man.

TROFÎMOV: Ji ber Varya ditirse ku em ê dil têkevin hev, bi rojan e ew me bi tenê nahêle. Ji ber tengfikirîna xwe, ew nizane ku em bi ser evînê ketine. Hemû mane û armanca jiyana me ew e ku em ji her tiştên nerast, ji her tiştên me ji azadî û dilşahiya me bêpar dihêle, birevin! Em ber bi pêş ve diçin! Em bêî ku tu astengiyan nas bikin, ber bi wê stêrka dûr ku diçûrise, diçin! Ber bi pêş! Li dû nemînin, hevalno!

ANYA (Destê xwe li hev dixê): Tu çi qasî xweş dipeyivî! (Kurtebêdengiyek.) Îro vir bêhawe xweş bû, ne wilo?

TROFÎMOV: Hewayek xweş e.

ANYA: Te çi bi min kir, Petya? Ji bo çi ez mîna berê ji bexçê vîşne hez nakim? Min ewqasî ji bexçê vîşne hez

53

dikir ku min fikir nedikir dê li rûyê dinyayê bexçeyekî wilo hebe.

TROFÎMOV: Hemû Rûsya bexçê me ye. Dinya mezin û xweş e, gelek cihên xweş li ser hene. (Kurtebêdengiyek.)

Bifikire, Anya, kalikê te, kalikê kalikê te, hemû bapîrên te xwediyên koleyan bûn, xwediyên însanên bi ruh bûn. Gelo ji her darekê, ji her

pelekî, ji her şaxekî rûyê mirovan li te nanihêrin?
Tu dengên wan nabihîzî? Xwedîbûna însanan...
Ev e, vê yekê hûn hemû ewqas guhertine ku ne tu,
ne diya te, ne jî xalê te dixwazin têbigihîjin ku
hûn bi perê xelkê û li ser piştta kesên ku hûn nahê-
lin ew gava xwe biavêjin hundurê we, dijîn. Ev e,
em bi kêmanî du sed salî li dû demê ne. Em heta
niha di tiştêkî de bi ser neketine; em li hemberî pa-
şerojê tu tevgerê nakin; em tenê felsefê dikin, ji
aciziya xwe gazinan dikin, an jî em vodka yê ve- dixwin. Ji bo em bikaribin
dema niho bijîn, divê
em pêşî deynê paşerojê bidin û jê rizgar bibin;
deynê paşerojê jî ancax em dikarin bi êşê bidin,
ancax em ê bikaribin bi xebata bêrwestan bidin.
Vê fêhm bike, Anya.

ANYA: Mala em tê de dijîn, ji xwe êdî ne ya me ye. Bi soz
ez ê ji wê malê bar bikim.

TROFÎMOV: Ger tiştêkî biçûk jî ku te bi yê malê ve girê
dide hebe, bibirre û bavêje, bavêje bîrekê.

ANYA (Bi hewes): Tu çiqasî xweş dibêjî!

TROFÎMOV: Baweriya xwe bi min bîne, Anya, ji min bawer
bike! Ez hê neketime sî saliya xwe; ez hê ciwan
im, ez hê xwendevan im, lê belê ma çi nehati-
54

dikir ku min fikir nedikir dê li rûyê dinyayê bexç-
eyekî wilo hebe.

TROFÎMOV: Hemû Rûsya bexçê me ye. Dinya mezin û
xweş e, gelek cihên xweş li ser hene. (Kurtebêdengiyek.)

Bifikire, Anya, kalikê te, kalikê kalikê te,
hemû bapîrên te xwediyên koleyan bûn, xwediyên
însanên bi ruh bûn. Gelo ji her darekê, ji her
pelekî, ji her şaxekî rûyê mirovan li te nanihêrin?
Tu dengên wan nabihîzî? Xwedîbûna însanan...
Ev e, vê yekê hûn hemû ewqas guhertine ku ne tu,
ne diya te, ne jî xalê te dixwazin têbigihîjin ku
hûn bi perê xelkê û li ser pişta kesên ku hûn nahê-
lin ew gava xwe biavêjin hundurê we, dijîn. Ev e,
em bi kêmanî du sed salî li dû demê ne. Em heta
niha di tiştê de bi ser neketine; em li hemberî pa-
şerojê tu tevgerê nakin; em tenê felsefê dikin, ji
acizîya xwe gazinan dikin, an jî em vodka yê ve- dixwin. Ji bo em bikaribin
dema niho bijîn, divê
em pêşî deynê paşerojê bidin û jê rizgar bibin;
deynê paşerojê jî ancax em dikarin bi êşê bidin,
ancax em ê bikaribin bi xebata bêrwestan bidin.
Vê fêhm bike, Anya.

ANYA: Mala em tê de dijîn, ji xwe êdî ne ya me ye. Bi soz
ez ê ji wê malê bar bikim.

TROFÎMOV: Ger tiştê biçûk jî ku te bi yê malê ve girê
dide hebe, bibirre û bavêje, bavêje bêrekê.

ANYA (Bi hewes): Tu çiqasî xweş dibêjî!

TROFÎMOV: Baweriya xwe bi min bîne, Anya, ji min bawer
bike! Ez hê neketime sî saliya xwe; ez hê ciwan
im, ez hê xwendevan im, lê belê ma çi nehati-

54

ye serê min! Zivistanan ez birçî dimînim; nexweş

dikevim, dilsar dibim, ez dibim mîna parsekekî belengaz. Ez herim ku jî qeder dev ji min bernade. Lê dîsan jî, her gav, bi şev roj ruhê min tijî hêvî ye. Ez dilşahiya ku nêzîk dibe hîs dikim, Anya... ez ji niha ve dibînim...

ANYA (Difikire): Hîv derdikeve.

(Dîsan bi gîtara Yepîhodov dengê strana şînê tê bihîstin. Hîv bilind dibe. Ji pişt spîndaran, ji cihekî dengê Varya ku bangî Anyayê dike, tete bihîstin:"Anya, tu li ku yîf")

TROFÎMOV: Erê, hîv derdikeve. (Kurtebêdengiyek.) Va ye li vir, dilşahî, va ye nêzîk dibe, nêzîk dibe...Ez dengê teperepa lingên dilşahiyê dibihîzim. Ê ger em dilşahiyê nebînin ê nejin, ma wê çi bibe? Wê yê din bibînin.

VARYA (Ji derveyîsehnê): Anya! Tu li ku yîf?

TROFÎMOV: Va ye dîsan ew e, Varya! (Bi hêrs.) Çi bela ye.

ANYA: Guh mediyê. Heydê em herin ber çem. Ew der pirr xweşe.

TROFÎMOV: Heydê! (Ew diçin.)

VARYA (Ji derveyîsehnê): Anya! Anya!

PERDE

55

ye serê min! Zivistanan ez birçî dimînim; nexweş dikevim, dilsar dibim, ez dibim mîna parsekekî belengaz. Ez herim ku jî qeder dev ji min bernade. Lê dîsan jî, her gav, bi şev roj ruhê min tijî hêvî ye. Ez dilşahiya ku nêzîk dibe hîs dikim, Anya... ez ji

niha ve dibînîm...

ANYA (Difikire): Hîv derdikeve.

(Dîsan bi gîtara Yepîhodov dengê strana şînê tê bihîstin. Hîv bilind dibe. Ji pişt spîndaran, ji cihekî dengê Varya ku bangî Anyayê dike, têtê bihîstin:"Anya, tu li ku yîf")

TROFÎMOV: Erê, hîv derdikeve. (Kurtebêdengiyek.) Va ye li vir, dilşahî, va ye nêzîk dibe, nêzîk dibe...Ez dengê teperepa lingên dilşahiyê dibihîzim. Ê ger em dilşahiyê nebînin ê nejin, ma wê çi bibe? Wê yên din bibînin.

VARYA (Ji derveyîsehnê): Anya! Tu li ku yîf?

TROFÎMOV: Va ye dîsan ew e, Varya! (Bi hêrs.) Çi bela ye.

ANYA: Guh mediyê. Heydê em herin ber çem. Ew der pîr xweşe.

TROFÎMOV: Heydê! (Ew diçin.)

VARYA (Ji derveyîsehnê): Anya! Anya!

PERDE

55

PERDEYA SÊYEMÎN

(Odeyeke rûniştinê ku bi kevanê derîji hêwana mêvanan ya dawiyê têtê veqetandin. Awîze pêketiye.

Ew orkestraya cihû ya ku di sehna dudan de behsa wê hatibû kirin, li antrê dengê lêdana wê tê.

Êvar e. Li hêwana mêvanan ronêke mezin dibe.

Dengê Sîmyonov-Ptşçîk tê bihîstin: "Promenade a une pairel" Yên ku dansê dikin cot bi cot derbasî oda rûniştinê dibin; Cotê pêşî dikeve hundur Pîşç-

îk û Sarlotta ye, piştî wan jî Trofîmov û Ranevskaya dikevin hundur; cotê sisiyan Anya û karmendê postê, yê çaran Varya û midûrê stasyonê û mêvanên din. Varya gava dans dike hêdîka digirt û hêsirên xwe pakij dike. Cotê dawî jî Dunyaşa û ferê xwe ye. Ew ji seriyekî diçine seriyê din.)

PÎŞÇÎK: Grand rond, balacez! Les cavaliers a genoux et remerciez vos dames!

(Fîrs fraq lê ye û di tepsiyekê de ava sodayê tîne.

Pîşçîk û Trofîmov dikevin odeya rûniştinê.)

PÎŞÇÎK: Xwîna min zêde ye; ez heta niha du caran felc bûme. Danskirin jî karekî zehmet e, lê, mîna ku tê

56

PERDEYA SÊYEMÎN

(Odeyêke rûniştinê ku bi kevanêke derîji hêwana mêvanan ya dawiyê têtê veqetandin. Awîze pêketiye.

Ew orkestraya cihû ya ku di sehna dudan de behsa wê hatibû kirin, li antrê dengê lêdana wê têtê.

Êvar e. Li hêwana mêvanan rondeke mezin dibe.

Dengê Sîmyonov-Pîşçîk têtê bihîstin: "Promenade a

une paire!" Yên ku dansê dikin cot bi cot derbasî

oda rûniştinê dibin; Cotê pêşî dikeve hundur Pîşçîk

îk û Sarlotta ye, piştî wan jî Trofîmov û Ranevskaya

dikevin hundur; cotê sisiyan Anya û karmendê

postê, yê çaran Varya û midûrê stasyonê û mê-

vanên din. Varya gava dans dike hêdîka digirt û

hêsirên xwe pakij dike. Cotê dawî jî Dunyaşa û

ferê xwe ye. Ew ji seriyekî diçine seriyê din.)

PÎŞÇÎK: Grand rond, balacez! Les cavaliers a genoux et remerciez vos dames!

(Fîrs frak lê ye û di tepsiyekê de ava sodayê tîne.

PÎŞÇÎK û Trofîmov dikevin odeya rûniştinê.)

PÎŞÇÎK: Xwîna min zêde ye; ez heta niha du caran felc bûme. Danskirin jî karekî zehmet e, lê, mîna ku tê
56

gotin: "Ger tu tevî kerî bû, tu mêr bî nereye, çawan

be, divê tu jî dêla xwe bihejînî." Ez mîna hespan

bi qewet im. Bavê min yê henekkir di nava

nûrê de razê. Wî ji bo eslê me digot ku em ji eslê

hespa ku Key Caligula kiribû senator e... (Rûdine.)

Di eslê xwe de ya herî xerab ew e ku metelikekî

min jî nemaye. Mirîşka birçî gêris di xewna

xwe de dibîne. (Gava dike xirexir tavilê şiyar dibe.)

Eynî mîna min. Hiş û aqilê min li ser pera ye.

TROFIMOV: Bi rastî jî gava mirov bala xwe dide te, tiştin

ku dişibin yê hespan di te de hene.

PÎŞÇÎK: Hesp benderuheke mukemel e. Qet nebe mirov dikare bifiroşe.

(Li odeya kêleka wan dengê lîstika bîlardoyê tê.

Di bin kevana deriyê hêwana mêvanan de Varya

xuya dibe.)

TROFÎMOV (Qerfê xwe pê dike): Madam Lopahîna! Madam Lopahîna!

VARYA (Bi hêrs): Mênkê kone!

TROFÎMOV: Erê, ez kone me, û ez bi vê jî serbilind im.

VARYA (Bi rûtirşî): Erê me orkestra kirê kiriye, lê em ê çawan

pera bidin? (Derdikeve.)

TROFÎMOV (Ji Pîşçîk re): Ji bo dayina deynê xwe yê faîzê ev enerjîya ku te heya niha xerc kiriye te ji bo armanceke din xerc bikira, te ê dinya ser û binê hev bikira.

PÎŞÇÎK: Ew fîlozofê han... Nietzsche... ew peyayê pir mezin... ew ê ku zekayeke wî ya ecêb heye, ew di

57

gotin: "Ger tu tevî kerî bû, tu mêr bî nereye, çawan be, divê tu jî dêla xwe bihejinî." Ez mîna hespan bi qewet im. Bavê min yê henekkir di nava nûrê de razê. Wî ji bo eslê me digot ku em ji eslê hespa ku Key Caligula kiribû senator e... (Rûdine.) Di eslê xwe de ya herî xerab ew e ku metelikekî min jî nemaye. Mirîşka birçî gêris di xewna xwe de dibîne. (Gava dike xirexir taviê şiyar dibe.) Eynî mîna min. Hiş û aqilê min li ser pera ye.

TROFÎMOV: Bi rastî jî gava mirov bala xwe dide te, tiştin ku dişibin yê hespan di te de hene.

PÎŞÇÎK: Hesp benderuheke mukemel e. Qet nebe mirov dikare bifiroşe.

(Li odeya kêleka wan dengê lîstika bîlardoyê tê.

Di bin kevana deriyê hêwana mêvanan de Varya xuya dibe.)

TROFÎMOV (Qerfê xwe pê dike): Madam Lopahîna! Madam Lopahîna!

VARYA (Bi hêrs): Mênkê kone!

TROFÎMOV: Erê, ez kone me, û ez bi vê jî serbilind im.

VARYA (Bi rûtirî): Erê me orkestra kirê kiriye, lê em ê çawan pera bidin? (Derdikeve.)

TROFÎMOV (Ji Pîşçîk re): Ji bo dayina deynê xwe yê faîzê ev enerjîya ku te heya niha xerc kiriye te ji bo armanceke din xerc bikira, te ê dinya ser û binê hev bikira.

PÎŞÇÎK: Ew fîlozofê han... Nietzsche... ew peyayê pir mezin... ew ê ku zekayeke wî ya ecêb heye, ew di 57

berhemên xwe de dibêje mirov dikare pereyên sexte çêbike.

TROFÎMOV: Ma te Nietzsche xwendîye?

PÎŞÇÎK: Çîk, Daşenka ji min re got. Ez ketîme tengasiyêke wîlo ku ez a niha dikarim pereyên sexte çap bikim.

Divê ez sibe ne du sibe 310 rubleyan bidim...

di destên min de jî 130 ruble heye. (Bi ecêbekê bê-rîkên xwe tev dide.) Kanî perekê min? (Bi kêf.)

Ha, va ye, ketîye binê astêr. Xwêdaneke cemidî ez girtim.

(Ranevskaya û Şarlotta dikevin hundur.)

RANEVSKAYA (Di ber xwe de kilameke Kafkasî bi navê

Lezgînka dinuhurîne): Ji bo çî Leonîd evqasî dirêj

kir? Ew evqasî li bajêr çî dîke? (Ji Dunyaşayê re.)

Dunyaşa, ka ji mêvanan bipirse bê ew çayê vedixwin?

TROFÎMOV: Bi îhtimaleke mezin, hê mazatê dest pê nekiriye.

RANEVSKAYA: Bi rasti me di demeke ne maqûl de bangî

dengbêjan kir, di demeke ne xweş de me xwest em

dans mansê bikin. Lê, em çî bikin! (Rûdine, bi

dengê nizim stranekê dinuhurîne.)

ŞARLOTTA (Desteyek kaxezên lîskê dide Pîşçîk.) Ev e, ji we re desteyek kaxezên lîskê. Ka li bêrîka xwe li kaxezekê bigere.

PÎŞÇÎK: Min dît.

ŞARLOTTA: Niha deste li hev bixe. Temam. Niha deste bide min, Mîrza Pîşçîkê delal. Ein, zwei, drei! Ka ni-
58

berhemên xwe de dibêje mirov dikare pereyên sexte çêbike.

TROFÎMOV: Ma te Nietzsche xwendiyê?

PÎŞÇÎK: Çîk, Daşenka ji min re got. Ez ketime tengasiyeke wilo ku ez a niha dikarim pereyên sexte çap bikim.

Divê ez sibe ne du sibe 310 rubleyan bidim...

di destên min de jî 130 ruble heye. (Bi ecêbekê bê-
rîkên xwe tev dide.) Kanî perekê min? (Bi kêf.)

Ha, va ye, ketiye binê astêr. Xwêdaneke cemidî ez girtim.

(Ranevskaya û Şarlotta dikevin hundur.)

RANEVSKAYA (Di ber xwe de kilameke Kafkasî bi navê

Lezgînka dinuhurîne): Ji bo çi Leonîd evqasî dirêj

kir? Ew evqasî li bajêr çi dike? (Ji Dunyaşayê re.)

Dunyaşa, ka ji mêvanan bipirse bê ew çayê vedixwin?

TROFÎMOV: Bi îhtimaleke mezin, hê mazatê dest pê nekiriye.

RANEVSKAYA: Bi rasti me di demeke ne maqûl de bangî

dengbêjan kir, di demeke ne xweş de me xwest em

dans mansê bikin. Lê, em çi bikin! (Rûdine, bi

dengê nizim stranekê dinuhurîne.)

ŞARLOTTA (Desteyek kaxezên lîskê dide Pîşçîk.) Ev e, ji we re desteyek kaxezên lîskê. Ka li bêrîka xwe li kaxezekê bigere.

PÎŞÇÎK: Min dît.

ŞARLOTTA: Niha deste li hev bixe. Temam. Niha deste bide min, Mîrza Pîşçîkê delal. Ein, zwei, drei! Ka ni-
58

ha li bêrîkên xwe binere.

PÎŞÇÎK (Kaxizeke lîskê ji bêrîka xwe derdixe): Heştliba maça! Te tam tê derxist. (Bi heyret.) Bi rastî jî!

ŞARLOTTA (Destê kaxezan di nava destê xwe de dihêle, ji Trofîmov re): Zû ji min re bêje, kaxeza li ser çi ye?

TROFÎMOV: Çîk, em bêjin keçika maça ye.

ŞARLOTTA: Te tê derxist! (Ji Pîşçîk re) Niha tu bêje, kaxeza li ser çi ye?

PÎŞÇÎK: Asa Kûpa ye.

ŞARLOTTA: Rast e! (Destê xwe li hev dixê, kaxez winda dibin.) Ox! îro çi xweş e. (Bi dengê sirrî mîna ku ji bin erdê derdikeve, lê vedigerîne: "Ox, erê, hewayek pirr xweş e, madam. " Tu xweşika di îdeala mindeyî.)

DENG: Ez jî te pirr xweşik dibînim, madam.

MIDÛRÊ STASYONÊ (Li çepikan dixê): Bravo, madam Vantrilog!

PÎŞÇÎK (Bi şaşmayî): Bifikir! Şarlottaya efsûnkar, bi kurtî dilê min kete te.

ŞARLOTTA: Dilê wî ketiye min! (Milên xwe dihejîne.) Gelo

qebiliyeta te ya ku tu dildar bibî heye? Guter Mensch, aber schlechter Musikant!

TROFÎMOV (Milê Pîşçtk ditepîne.) Hê, hespê qert...

ŞARLOTTA: Niha ji kerema xwe re bala xwe bidin min, ez ê lîstikeke din nîşanî we bidim. (Ji ser qoltixekê radihêje betaniyeke biçûk.) Hûn dibînin, ev betaniyek e, hem jî betaniyeke xweşik e; ez vê betaniya xweşik difiroşim. (Betaniyê dawdişîne.) Kî dikire? Kîdikire?

59

ha li bêrîkên xwe binere.

PÎŞÇÎK (Kaxizeke lîskê ji bêrîka xwe derdixe): Heştliba maça! Te tam tê derxist. (Bi heyret.) Bi rastî jî!

ŞARLOTTA (Destê kaxezan di nava destê xwe de dihêle, ji Trofîmov re): Zû ji min re bêje, kaxeza li ser çi ye?

TROFÎMOV: Çîk, em bêjin keçika maça ye.

ŞARLOTTA: Te tê derxist! (Ji Pîşçîk re) Niha tu bêje, kaxeza li ser çi ye?

PÎŞÇÎK: Asa Kûpa ye.

ŞARLOTTA: Rast e! (Destê xwe li hev dixê, kaxez winda dibin.) Ox! îro çi xweş e. (Bi dengêkî sirrî mîna ku ji bin erdê derdikeve, lê vedigerîne: "Ox, erê, hewayek pirr xweş e, madam. " Tu xweşika di îdeala mindeyî.)

DENG: Ez jî te pirr xweşik dibînim, madam.

MIDÛRÊ STASYONÊ (Li çepikan dixê): Bravo, madam Vantrilog!

PÎŞÇÎK (Bi şaşmayî): Bifikir! Şarlottaya efsûnkar, bi kurtî dilê min kete te.

ŞARLOTTA: Dilê wî ketiye min! (Milên xwe dihejîne.) Gelo qebiliyeta te ya ku tu dildar bibî heye? Guter Mensch, aber schlechter Musikant!

TROFÎMOV (Milê Pîşçtk ditepîne.) Hê, hespê qert...

ŞARLOTTA: Niha ji kerema xwe re bala xwe bidin min, ez ê lîstikeke din nîşanî we bidim. (Ji ser qoltixekê radihêje betaniyeke biçûk.) Hûn dibînin, ev betaniyek e, hem jî betaniyeke xweşik e; ez vê betaniya xweşik difiroşim. (Betaniyê dawdişîne.) Kî dikire? Kîdikire?

59

PÎŞÇÎK: (Bi heyranî) Ecêb e!

ŞARLOTTA: Ein, zwei, drei! (Bi xurtî radihêje betaniyê, ji bin wê Anya derdikeve, çongên xwe difisîne, silavekê dide, direve ba diya xwe, wê hemêz dike, paşê di nava coşiya temaşevanan de bi bazdan dikeve hêwana mêvanan.)

RANEVSKAYA (Li çepikan dixê): Bravo! Bravo!

ŞARLOTTA: Careke din. Ein, zwei, drei (Betaniyê radike, vê carê jî Varya ji bin derdikeve, ew jîxwe ditewîne û silavêdide.)

PÎŞÇÎK (Bi heyranî): Ecêb e!

ŞARLOTTA: Xelas. (Betaniyê davêje ji Pîşçîk re, çongên xwe difisîne, silav dide, û bi bazdan diçe hêwana mêvanan.)

PÎŞÇÎK (Bi lez bi dû wê de dimeşe): Ax, nereheta biçûk... Çi

keçik e! Çi keçik e! (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Hê jî ji Leonîd deng dernakeve. Gelo ev çi ye ku dihêle ew evqasî ji bo wê li bajêr bimîne?

Diviyabû ew niha xelas bûbûya; milk an hatiye firotin, an jî qet derneketiye mazatê; çima ew evqasî min di meraqê de dihêle?

VARYA (Wî haş dike): Ez êmin im ku xalê min milk kirî ye.

TROFÎMOV (Bi henekpêkirin): Erê, ji sedî sed kirî ye!

VARYA: Ji bo ku ew milk bikire û îpotekê derbasî ser navê xwe bike, pîrka min jê re wekaletname şandibû.

Wê ev ji bo xatirê Anyayê kir. Ez êmin im, wê Xwedê alîkariya me bike, xalê min ê milk bikire.

RANEVSKAYA: Pîrka te ya li Yaroslavlê ji bo ku milk li ser navê xwe bide kirîn wê panzdeh hezar ruble şandiye -baweriya wê bi me nayê- çi ku ev pere têra

60

PÎŞÇÎK: (Bi heyranî) Ecêb e!

ŞARLOTTA: Ein, zwei, drei! (Bi xurtî radihîje betaniyê, ji bin wê Anya derdikeve, çongên xwe difisîne, silavekê dide, direve ba diya xwe, wê hemêz dike, paşê di nava coşiya temaşevanan de bi bazdan dikeve hêwana mêvanan.)

RANEVSKAYA (Li çepikan dixê): Bravo! Bravo!

ŞARLOTTA: Careke din. Ein, zwei, drei (Betaniyê radike, vê carê jî Varya ji bin derdikeve, ew jîxwe ditewîne û silavêdide.)

PÎŞÇÎK (Bi heyranî): Ecêb e!

ŞARLOTTA: Xelas. (Betaniyê davêje ji Pîşçîk re, çongên

xwe difisîne, silav dide, û bi bazdan diçe hêwana
mêvanan.)

PÎŞÇÎK (Bi lez bi dû wê de dimeşe): Ax, nereheta biçûk... Çi
keçik e! Çi keçik e! (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Hê jî ji Leonîd deng dernakeve. Gelo ev çi
ye ku dihêle ew evqasî ji bo wê li bajêr bimîne?

Diviyabû ew niha xelas bûbûya; milk an hatiye firotin,
an jî qet derneketiye mazatê; çima ew evqasî
min di meraqê de dihêle?

VARYA (Wî haş dike): Ez êmin im ku xalê min milk kirî ye.

TROFÎMOV (Bi henekpêkirin): Erê, ji sedî sed kirî ye!

VARYA: Ji bo ku ew milk bikire û îpotekê derbasî ser navê
xwe bike, pîrka min jê re wekaletname şandibû.

Wê ev ji bo xatirê Anyayê kir. Ez êmin im, wê
Xwedê alîkariya me bike, xalê min ê milk bikire.

RANEVSKAYA: Pîrka te ya li Yaroslavlê ji bo ku milk li ser
navê xwe bide kirîn wê panzdeh hezar ruble şandiye
-baweriya wê bi me nayê- çi ku ev pere têra

60

faîza wê jî nake. (Bi herdu destên xwe rûyê xwe
dinuxumîne.) Qedera min îro belî dibe, erê, qedera
min.

TROFÎMOV (Heneka bi Varya dike): Madam Lopahîna!

VARYA (Bi hêrs): Ebedî! Tu du caran ji unîversîteyê hatiya
qewirandin.

RANEVSKAYA: Tu ji bo çi hêrs dibî, Varya? Ma çi bûye ku
wî ji te re gotiye Madam Lopahîna. Ger tu bixwazî
tu dikarî bi Lopahîn re bizewicî. Ew mêrikekî

pak û bedew e; lê ger tu nexwazî tu nazewicî. Kes zorê li te nake, keçika min.

VARYA: Ez vî karî pirr cidî digirim, dayê. Ew mirovekî qence, kêfa min jê re tê.

RANEVSKAYA: Wê çaxê bi wî re bizewice. Ez têngihîjim bê tu li bendî çî ye?

VARYA: Ez nikanim pêşniyaza zewacê jê re bibim, ne wilo yadê? Ev serê du salan e her kes ji min re behsa wî dike, lê herçî ew e, an ew qet behsa vê yekê nake, an jî ku behs bike jî bi qerf dike. Ez têngihîjim.

Her ku diçe ew dewlemend dibe, ew bi karê xwe re mijûl e, wextê wî ji min re tune. Ger hinek perê min hebûya, hema hindikek, tenê sed ruble, min ê dev ji her tiştî berdaya û biçûya. Ez ê bibûma Rahîbe.

TROFÎMOV (Zarîwê dike, bi henek): Çî dilşahî!

VARYA (Ji Trofîmov re): Herçî xwendevan e divê hebekî hişê wî li sêrî be. (Bi dengê hê nermtir, bi girt) Tu çî mekroh bûyî, Petya. Tu çî pîr bûyî! (Edî bêîgirî, ji Ranevskayayê re.) Lê ez qet nikanim vala bisekinim, yadê. Her rojên Xwedê divê ez bi tişteki mi-

61

faîza wê jî nake. (Bi herdu destên xwe rûyê xwe dinuxumîne.) Qedera min îro belî dibe, erê, qedera min.

TROFÎMOV (Heneka bi Varya dike): Madam Lopahîna!

VARYA (Bi hêrs): Ebedî! Tu du caran ji unîversîteyê hatiyî qewirandin.

RANEVSKAYA: Tu ji bo çî hêrs dibî, Varya? Ma çî bûye ku wî ji te re gotiye Madam Lopahîna. Ger tu bixwazî tu dikarî bi Lopahîn re bizewicî. Ew mêrikekî pak û bedew e; lê ger tu nexwazî tu nazewicî. Kes zorê li te nake, keçika min.

VARYA: Ez vî karî pirr cidî digirim, dayê. Ew mirovekî qenc e, kêfa min jê re tê.

RANEVSKAYA: Wê çaxê bi wî re bizewice. Ez têngihîjim bê tu li bendî çî ye?

VARYA: Ez nikanim pêşniyaza zewacê jê re bibim, ne wilo yadê? Ev serê du salan e her kes ji min re behsa wî dike, lê herçî ew e, an ew qet behsa vê yekê nake, an jî ku behs bike jî bi qerf dike. Ez têdigihîjim.

Her ku diçe ew dewlemend dibe, ew bi karê xwe re mijûl e, wextê wî ji min re tune. Ger hinek perê min hebûya, hema hindikek, tenê sed ruble, min ê dev ji her tiştî berdaya û biçûya. Ez ê bibûma Rahîbe.

TROFÎMOV (Zarîwê dike, bi henek): Çî dilşahî!

VARYA (Ji Trofîmov re): Herçî xwendevan e divê hebekî hişê wî li sêrî be. (Bi dengê hê nermtir, bi girt) Tu çî mekroh bûyî, Petya. Tu çî pîr bûyî! (Edî bêîgirî, ji Ranevskayayê re.) Lê ez qet nikanim vala bisekinim, yadê. Her rojên Xwedê divê ez bi tişteki mi-

61

jûl bim.

(Yaşa dikeve sehnê.)

YAŞA (Ji bo ku nekene xwe bi zorê digire): Yepîhodov destikekî

bîlardoyê şikand. (Derdikeve.)

VARYA: Çi karê Yepîhodov li vir heye? Kê destûr daye wî ku ew bi bîlaro bilîze? Ez ji van mirovan qet tiştekî fêhm nakim. (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Bêhna wê teng neke, Petya. Ji xwe ew xemgîn e, ma tu nabînî?

TROFIMOV: Xwezî ew ne ewqasî karguzar bûya, pozê xwe nexista karê her kesî. Hemû havînê wê rehetî û huzûr neda min û diya min. Ew ditirse ku ez û Anya dildarî hev bibin. Jê re çî? Ji bo ew wilo bifikire jî li navê tu sebab tune, herhal ez ne yeke wilo me ku ez xerab bibim. Ez û Anya em di ser evînê re ne.

RANEVSKAYA: Wê çaxê ez texmîn dikim em jî di bin evînê re ne. (Bêhawe bi heyecan e.) Ji bo çî ew heta niha nehat, Leonîd? Ax, min bizanîba bê milk hatiye firotin an na! Felaketeke wilo ye ku ez nizamim bê ez ê çî bikim. Ez şaş bûme. . . Ez ê niha bang bikim û bibêjim şewat heye, ez ê dînitîyekê bikim. Min xelas bike, Petya, bipeyive, ji min re tişteki bibêje, bi min re bipeyive!

TROFIMOV: Wê çî jê derkeve ku milk îro bête firotin an jî neyê firotin? Tiştê bûye, bûye. Êdî vege tune, rê hatine girtin. Bêhna xwe fireh bike Madam Ranevskaya. Divê tu êdî bê sebab xwe nexapîne; he-

62

jûl bim.

(Yaşa dikeve sehnê.)

YAŞA (Ji bo ku nekene xwe bi zorê digire): Yepîhodov destikekî bîlardoyê şikand. (Derdikeve.)

VARYA: Çi karê Yepîhodov li vir heye? Kê destûr daye wî ku ew bi bîlaro bilîze? Ez ji van mirovan qet tiştekî fêhm nakim. (Derdikeve.)

RANEVSKAYA: Bêhna wê teng neke, Petya. Ji xwe ew xemgîn e, ma tu nabînî?

TROFIMOV: Xwezî ew ne ewqasî karguzar bûya, pozê xwe nexista karê her kesî. Hemû havînê wê rehetî û huzûr neda min û diya min. Ew ditirse ku ez û Anya dildarî hev bibin. Jê re çi? Ji bo ew wilo bifikire jî li navê tu sebeb tune, herhal ez ne yeke wilo me ku ez xerab bibim. Ez û Anya em di ser evînê re ne.

RANEVSKAYA: Wê çaxê ez texmîn dikim em jî di bin evînê re ne. (Bêhawe bi heyecan e.) Ji bo çi ew heta niha nehat, Leonîd? Ax, min bizanîba bê milk hatiye firotin an na! Felaketeke wilo ye ku ez nizanim bê ez ê çi bikim. Ez şaş bûme. . . Ez ê niha bang bikim û bibêjim şewat heye, ez ê dînitîyekê bikim. Min xelas bike, Petya, bipeyive, ji min re tişteke bibêje, bi min re bipeyive!

TROFIMOV: Wê çi jê derkeve ku milk îro bête firotin an jî neyê firotin? Tiştê bûye, bûye. Êdî veger tune, rê hatine girtin. Bêhna xwe fireh bike Madam Ranevskaya. Divê tu êdî bê sebeb xwe nexapîne; he-

62

ma carekê rastiyê qebûl bike.

RANEVSKAYA: Rastiya çi? Tiştê tê fêhmkirin tu rastî û nerastiyê dibînî, lê hebe tune be çavên min kor bûne, ez tiştê nabînim. Zaroka min a xweşik, meseleyên weha mezin hûn tavilê çareser dikin, lê ji min re bêje, Petya, gelo ev ji ber ciwanbûna te, ji ber ku te di çareserkirina problemên xwe de qet êş û ezab nekişandibe, bi pêş nekeve? Tu bi cesaret li pêşerojê dinêrî. Ev ne ji ber ku tu ê di pêşerojê de tiştê bitirs nebînî, an jî ne li bendî be, an jî ji ber ku jiyana xwe ji ber çavên te yê ciwan vedişêre be? Tu ji me cesûrtir î, durusttir î, ji me hê kûrtir difikirî, lê hebe min jî fêhm bike, bila gunehê te bi min were. Ma tu nabînî? Ez li vir hatime dinyayê, dê û bavê min li vir jiyane, kalikê min li vir jiyaye; ez ji vê malê hez dikim; ger bexçeyê vîşne tunebe, ji bo min tu mana jiyana namîne, lê ger wê illim bexçe were firotin, ji bo Xwedê min jî bifiroşin! (Xwe davêje stûyê Trofîmov û eniya wî maçî dike.) Lawê min li vir xeniqî bû. (Bi girî.) Li hember min bi rehim be Petyayê delal, Petyayê qenc!

TROFÎMOV: Tu dizanî, ez ji dil ji te hez dikim.

RANEVSKAYA: Erê, ji xwe, lê te dikarîbû ev bi celebê din bigota. (Gava ew destmala xwe ji bêrîka xwe derdixe, telegrafek dikeve xwarê.) Tu zane bê ez îro çiqasî aciz im! Vir gelekî qerebalix e, her dengek mîna şîşekê li dilê min dikeve. Dest û lingên min dihejin... lê çawan be ez nikanim bi tenê bimînim,

bêdengî min ditirsîne. Ji min hêrs nebe, Petya, ez
63

ma carekê rastiye qebûl bike.

RANEVSKAYA: Rastiya çi? Tiştê tê fêhmkirin tu rastî û nerastiye dibînî, lê hebe tune be çavên min kor bûne, ez tiştê nabînim. Zaroka min a xweşik, meseleyên weha mezin hûn tavilê çareser dikin, lê ji min re bêje, Petya, gelo ev ji ber ciwanbûna te, ji ber ku te di çareserkirina problemên xwe de qet êş û ezab nekişandibe, bi pêş nekeve? Tu bi cesaret li pêşerojê dinêrî. Ev ne ji ber ku tu ê di pêşerojê de tiştê bitirs nebînî, an jî ne li bendî be, an jî ji ber ku jiyana xwe ji ber çavên te yê ciwan vedişêre be? Tu ji me cesûrtir î, durusttir î, ji me hê kûrtir difikirî, lê hebekî min jî fêhm bike, bila gunehê te bi min were. Ma tu nabînî? Ez li vir hatime dinyayê, dê û bavê min li vir jiyane, kalikê min li vir jiyaye; ez ji vê malê hez dikim; ger bexçeyê vîşne tunebe, ji bo min tu mana jiyane namîne, lê ger wê illim bexçe were firotin, ji bo Xwedê min jî bifiroşin! (Xwe davêje stûyê Trofîmov û eniya wî maçî dike.) Lawê min li vir xeniqî bû. (Bi girî.) Li hember min bi rehim be Petyayê delal, Petyayê qenc!

TROFÎMOV: Tu dizanî, ez ji dil ji te hez dikim.

RANEVSKAYA: Erê, ji xwe, lê te dikarîbû ev bi celebê din bigota. (Gava ew destmala xwe ji bêrîka xwe derdixe, telegrafek dikeve xwarê.) Tu zane bê ez îro

çiqasî aciz im! Vir gelekî qerebalix e, her dengek
mîna şîşekê li dilê min dikeve. Dest û lingên min
dihejin... lê çawan be ez nikanim bi tenê bimînim,
bêdengî min ditirsîne. Ji min hêrs nebe, Petya, ez
63

mîna kurê xwe ji te hez dikim. Min ê bi kêfxweşî
Anya bidaya te... Ez sond dixwim... Lê, kurê min
ê delal, divê tu bixebite, Petyakê min, qet nebe divê
tu unîversîteyê xelas bikî. Tu karekî nakî, tu ji
cihekî diçî cihekî din... Çi ecêb e, ne wilo? Tu heq
didî min, ne wilo? Û divê tu tişteki ji vê rîha xwe
bikî, tu ê hingî çelengtir bibî. (Bi ken.) Ev rîha te,
te mîna qirdikan dide nîşandan.

TROFÎMOV: (Radihîje telegrafa li erdê): Niyeta min a ku
ez bibim Adonîs tune.

RANEVSKAYA: Ew telegraf ji Parîsê ye. Ez rojê yekê distî-
nim. Do yek hatibû, îro jî yek. Ew peyayê bêînsaf
dîsan nexweş ketiye, rewşa wî xerab e... Dixwaze
ez wî efû bikim û dîsan vegerim ba wî; bi rastî
divê ez vegerim ba wî. Tu bi sertî li min dinêrî...

Baş e, ma ez çî bikim layê min, ez çî bikim? Nexweş
ketiye, bi tenê ye, xemgîn e. Kî ê li wî binêre?

Kî ê nehêle ew karên dînîti bike, kî ê dermanên wî
di wextê de bidiyê? Çima ez ê ji lixwedîderketina
wî şerm bikim? Ez ji wî hez dikim, ev tişteki pir
vekirî ye. Ez ji wî hez dikim. Tu dibê qey ew ferekî
destara ye, bi stûyê min ve girêdayî ye û min diki-
şîne binê avê, ez ji kevirê xwe hez dikim û ez nikanim

bêî wî bijîm. (Destê Trofîmov dixê nava destên xwe.) Tu di derheqa min de neçê nefikirî, Petya, tiştêkî nebêje. . . qet tiştêkî. . . TROFÎMOV (Kelogirî dibe): Ji bo Xwedê, rastgoyiya min bibexşîne, lê vî peyayî tu şêlandiye.

RANEVSKAYA: Na, na, na! (Destên xwe datîne ser guhên xwe û didewisîne.) Divê tu tiştên wilo nebêjî!

64

mîna kurê xwe ji te hez dikim. Min ê bi kêfxweşî Anya bidaya te... Ez sond dixwim... Lê, kurê min ê delal, divê tu bixebite, Petyakê min, qet nebe divê tu unîversîteyê xelas bikî. Tu karekî nakî, tu ji cihekî diçî cihekî din... Çi ecêb e, ne wilo? Tu heq didî min, ne wilo? Û divê tu tiştêkî ji vê rîha xwe bikî, tu ê hingî çelengtir bibî. (Bi ken.) Ev rîha te, te mîna qirdikan dide nîşandan.

TROFÎMOV: (Radihîje telegrafa li erdê): Niyeta min a ku ez bibim Adonîs tune.

RANEVSKAYA: Ew telegraf ji Parîsê ye. Ez rojê yekê distînim. Do yek hatibû, îro jî yek. Ew peyayê bêînsaf dîsan nexweş ketiye, rewşa wî xerab e... Dixwaze ez wî efû bikim û dîsan vegerim ba wî; bi rastî divê ez vegerim ba wî. Tu bi sertî li min dinêrî... Baş e, ma ez çî bikim layê min, ez çî bikim? Nexweş ketiye, bi tenê ye, xemgîn e. Kî ê li wî binêre? Kî ê nehêle ew karên dînîtî bike, kî ê dermanên wî di wextê de bidiyê? Çima ez ê ji lixwedîderketina wî şerm bikim? Ez ji wî hez dikim, ev tiştêkî pir

vekirî ye. Ez ji wî hez dikim. Tu dibê qey ew ferekî destara ye, bi stûyê min ve girêdayî ye û min dikişîne binê avê, ez ji kevirê xwe hez dikim û ez nikanim bêî wî bijîm. (Destê Trofîmov dixê nava destên xwe.) Tu di derheqa min de neçê nefikirî, Petya, tiştêkî nebêje. . . qet tiştêkî. . . TROFÎMOV (Kelogirî dibe): Ji bo Xwedê, rastgoyiya min bibexşîne, lê vî peyayî tu şêlandiye.

RANEVSKAYA: Na, na, na! (Destên xwe datîne ser guhên xwe û didewisîne.) Divê tu tiştên wilo nebêjî!

64

TROFÎMOV: Ew mirovekî xerab e; ji te pê ve her kes pê dizane; ew qeşmerekî kirêt e, pîs e. . . RANEVSKAYA (Bi hêrs, lê xwe digire): Tu ketiyî bîst û şeş, bîst û heft saliya xwe, lê tu hê jî mîna zarokêkî dibistana destpêkê yî!

TROFÎMOV: Xema kê ye?

RANEVSKAYA: Êdî dema tu mezin bibî û bibî zilam hatiye! Divê tu mirovên dildar fêhm bikî. Divê tu bi xwe jî ji yekê hez bikî, dildar bibî! (Bi hêrs.) Erê, erê! Tu têtilyên vê bi safîtiyê filan re tune... Bi kurtî tu bêcinsiyet î, tu rebenekî ecêb î, benderuhekî nenormal...

TROFÎMOV (Bi dehşet): Ev çi dibêje?

RANEVSKAYA: "Ez di ser evînê re me" ye! Tu ne di ser evînê re, mîna Fîrsê me dibêje, tu rebenek e. Di vî emrê te de divê dostika mirov hebe.

TROFÎMOV (Ji heyretê devê wî bihustekê vedibe): Ev tiştêkî ecêb e! Ew çawan dikare gotinên weha bibêje!

(Li serê xwe dixê û bi lez diçe hêwana mêvanan.)

Ev tiştê ecêb e, ez nikanim qebûl bikim! Ez diçim. (Derdikeve, lê tavilê bi paş de vedigere.) Êdî tu têkiliya min bi te re nemaye. (Diçe antre.)

RANEVSKAYA (Li dû Trofîmov bang dike): Ka deqîqeyekê raweste, Petya! Zaroktiyê meke, min got ez henekekê bi te bikim! Petya!

(Dengê yekî ku di pêlikan de bi bazdan dadikeve jêr û dû re jî dengê gurmînekê tê bihîstin. Ji pişt sehnê jî dengê qîrînên Anya û Varya tê bihtstin, lê piştî kurtedemekê dengê kenên bi pîrçîn tê.)

65

TROFÎMOV: Ew mirovekî xerab e; ji te pê ve her kes pê dizane; ew qeşmerekî kirêt e, pîs e. . . RANEVSKAYA (Bi hêrs, lê xwe digire): Tu ketiyê bîst û şeş, bîst û heft saliya xwe, lê tu hê jî mîna zarokê dibistana destpêkê yî!

TROFÎMOV: Xema kê ye?

RANEVSKAYA: Êdî dema tu mezin bibî û bibî zilam hatiye! Divê tu mirovên dildar fêhm bikî. Divê tu bi xwe jî ji yekê hez bikî, dildar bibî! (Bi hêrs.) Erê, erê! Tu têkilyên vê bi safîtiyê filan re tune... Bi kurtî tu bêcinsiyet î, tu rebenekê ecêb î, benderuhekê nenormal...

TROFÎMOV (Bi dehşet): Ev çî dibêje?

RANEVSKAYA: "Ez di ser evînê re me" ye! Tu ne di ser evînê re, mîna Fîrsê me dibêje, tu rebenek e. Di vî emrê te de divê dostika mirov hebe.

TROFÎMOV (Ji heyretê devê wî bihustekê vedibe): Ev tiştêkî

ecêb e! Ew çawan dikare gotinên weha bibêje!
(Li serê xwe dixê û bi lez diçe hêwana mêvanan.)

Ev tiştê ecêb e, ez nikanim qebûl bikim! Ez di-
çim. (Derdikeve, lê tavilê bi paş de vedigere.) Êdî
tu têtikiya min bi te re nemaye. (Diçe antre.)

RANEVSKAYA (Li dû Trofîmov bang dike): Ka deqîqeyekê
raweste, Petya! Zaroktiyê meke, min got ez henekekê
bi te bikim! Petya!

(Dengê yekî ku di pêlikan de bi bazdan dadikeve
jêr û dû re jî dengê gurmînekê têt bihîstin. Ji pişt
sehnê jî dengê qîrînên Anya û Varya têt bihtstin, lê
piştî kurtedemekê dengê kenên bi pîrçîn têt.)

65

RANEVSKAYA: Çi dibe?

(Anya bi bazdan dikeve sehnê.)

ANYA (Bi ken): Petya ji pêlikan ket. (Dîsan bi bazdan derdikeve.)

RANEVSKAYA: Çi lawikekê ecêb e!

(Midûrê stasyonê têt orta sehnê û helbesta Aleksey
Tolstoy ya bi navê GUNEHKAR dixwîne. Her
kes di cihê xwe de radiwestin û lê guhdarî dikin.
Lê piştî xwendina çend rêzan gava ji antrê dengê
muzîkeke valsê têt bihîstin, midûrê stasyonê dev
ji xwendina helbestê berdide. Hemû dest pê dikin
û bi hev re valsê dikin. Trofîmov, Anya, Varya û
Ranevskaya ji antrê dikevin sehnê.)

RANEVSKAYA: Were, Petya... ka were, zarokê saf. Bibuhure.

Were em dansê bikin. (Ranevskaya bi Trofî-
mov re dansê dike.)

(Anya û Varya bi hev re dansê dikin. Fîrs dikeve sehnê û gopalê xwe dispêre dîwarê ber derî. Yaşa jî dikeve odeya rûniştinê, li ser lingan radiweste û danskiran temaşe dike.)

YAŞA: Tu çawa yî, kalo?

FÎRS: ez ne zêde baş im. Berê her tim baron, general, amîral dihatin baloyên me, niha em radibin bang kar-

66

RANEVSKAYA: Çi dibe?

(Anya bi bazdan dikeve sehnê.)

ANYA (Bi ken): Petya ji pêlikan ket. (Dîsan bi bazdan derdikeve.)

RANEVSKAYA: Çi lawikekî ecêb e!

(Midûrê stasyonê tê orta sehnê û helbesta Aleksey

Tolstoy ya bi navê GUNEHKAR dixwîne. Her

kes di cihê xwe de radiwestin û lê guhdarî dikin.

Lê piştî xwendina çend rêzan gava ji antrê dengê muzîkeke valsê tête bihîstin, midûrê stasyonê dev

ji xwendina helbestê berdide. Hemû dest pê dikin

û bi hev re valsê dikin. Trofîmov, Anya, Varya û

Ranevskaya ji antrê dikevin sehnê.)

RANEVSKAYA: Were, Petya... ka were, zarokê saf. Bibuhure.

Were em dansê bikin. (Ranevskaya bi Trofîmov re dansê dike.)

(Anya û Varya bi hev re dansê dikin. Fîrs dikeve sehnê û gopalê xwe dispêre dîwarê ber derî. Yaşa jî dikeve odeya rûniştinê, li ser lingan radiweste û danskiran temaşe dike.)

YAŞA: Tu çawa yî, kalo?

FÎRS: ez ne zêde baş im. Berê her tim baron, general, amîral dihatin baloyên me, niha em radibin bang kar-

66

mendên postê û midûrê stasyonê dikin jî, ew dil nakin werin. Ez pir jar bûme, dermanê min jî nemaye.

Mîrzayê rehmetî, kalikê van, li dijî hemû derdan şima dida me. Ev bîst sal in, belkî ji bîst salî zêdetir e jî, ez şimayê dixwim. Divê ji ber vê yekê be ez heta niha nemirime.

YAŞA: Of, tu çi mirov aciz dikî, kalo. (Dibawişke.) Bi rasti dema te û cehemandina te hatiye û buhuriye jî.

FÎRS: Ax! Şeytan gidî şeytan. . . (Di ber xwe de dipeyive.) (Trofîmov û Ranevskaya ji hêwana mêvanan dansê dikin û derbasî odeya rûniştinê dibin.)

RANEVSKAYA: Mersî. Ez ê rûnim. (Rûdine.) Ez westiyam. (Anya dikeve hundir.)

ANYA (Bi heyecan): Li mûtfaxê zilamekî got ku bexçeyê vîşne îro hate firotin.

RANEVSKAYA: Hatiye firotin? Kê kirî?

ANYA: Negot. Çû.

(Anya dixwaze bi Trofîmov re dansê bike, bi danskirin derbasî hêwana mêvanan dibe.)

YAŞA: Kalekî qeşmer bû. . . yekî biyanî.

FÎRS: Hê mîrza venegeriyaye, paltoyekî tenik lê ye. Ji sedî sed ew ê serma bigire. Ax ev xortanî, ax ev cahilû!

RANEVSKAYA: Wê ev meraqa han min bikuje. Yaşa, ka here binêre bê firotiyê kê.

67

mendên postê û midûrê stasyonê dikin jî, ew dil
nakin werin. Ez pir jar bûme, dermanê min jî nemaye.
Mîrzayê rehmêtî, kalikê van, li dijî hemû
derdan şima dida me. Ev bîst sal in, belkî ji bîst
salî zêdetir e jî, ez şimayê dixwim. Divê ji ber vê
yekê be ez heta niha nemirime.

YAŞA: Of, tu çi mirov aciz dikî, kalo. (Dibawîşke.) Bi rasti
dema te û cehemandina te hatiye û buhuriye jî.

FÎRS: Ax! Şeytan gidî şeytan. . . (Di ber xwe de dipeyive.)
(Trofîmov û Ranevskaya ji hêwana mêvanan dansê
dikin û derbasî odeya rûniştinê dibin.)

RANEVSKAYA: Mersî. Ez ê rûnim. (Rûdine.) Ez westiyam.
(Anya dikeve hundir.)

ANYA (Bi heyecan): Li mûtfaxê zilamekî got ku bexçeyê
vîşne îro hate firotin.

RANEVSKAYA: Hatiye firotin? Kê kirî?

ANYA: Negot. Çû.

(Anya dixwaze bi Trofîmov re dansê bike, bi
danskirin derbasî hêwana mêvanan dibe.)

YAŞA: Kalekî qeşmer bû. . . yekî biyanî.

FÎRS: Hê mîrza venegeriyaye, paltoyekî tenik lê ye. Ji sedî
sed ew ê serma bigire. Ax ev xortanî, ax ev cahilû!

RANEVSKAYA: Wê ev meraqa han min bikuje. Yaşa, ka
here binêre bê firotiyê kê.

67

YAŞA: Lê kalo ji mêj ve çûye. (Dikene.)

RANESVKAYA (Hebekî bi hêrs): Tu bi çi dikenî? Çi ye ya
ku te ewqasî kêfxweş dike?

YAŞA: Ev Yepîhodov, çi zilamekî komîk e. Rûyê wî ne bi xêr e!

RANEVSKAYA: Fîrs, ger malixane were firotin tu ê bi ku de herî?

FÎRS: Hûn ku bixwazin ez ê herim wir.

RANEVSKAYA: Çima tu wilo dixuyî? Ma qey tu nexweş î? Diviyabû tu razayîba.

FÎRS (Bi henekpêkirin): Erêê, a razanê ez ê razêm, lê kî ê li kar binihêre? Kî ê der û dorê bide hev? Di vê zîrmalê de ji min pê ve kes tune ku.

YAŞA: Bi destûra te be madam, ez dixwazim pêşniyazekê bikim? Ger tu dîsan biçî Parîsê min jî bi xwe re bibe.

Li vir mayina min bêîmkan e. (Çavên xwe li dora xwe digêrîne; bi dengêkî nizimtir.) Ne hewce ye ez ji te re bibêjim, ji te ve xuyaye, vir welatekî cahîl e, bi mirovên wan re exlaq tune, kultureke xav e! Xwarinên li mûtfaxê genî ne, mîna ku ev hemû têr nekin, yek jî çûyin û hatina Fîrs ya li nava lîngan û bêmanebûna peyva wî ya di ber xwe de. Ez lava dikim, min jî bi xwe re bibe!

(Pîşçîk dikeve sehnê.)

PÎŞÇÎK: Gelo te ê ev zewqa han ji min re bibexşanda... tûrrek du tûrr vals, xanima xweşik (Ranevskaya dikeve milê wî.) Xanima delal ya ku ez heyran im, bi rastî jî divê ez 180 rubleyî ji te deyn bikim. (Bi

68

YAŞA: Lê kalo ji mêj ve çûye. (Dikene.)

RANESVKAYA (Hebekî bi hêrs): Tu bi çi dikenî? Çi ye ya

ku te ewqasî kêfxweş dike?

YAŞA: Ev Yepîhodov, çi zilamekî komîk e. Rûyê wî ne bi xêr e!

RANEVSKAYA: Fîrs, ger malixane were firotin tu ê bi ku de herî?

FÎRS: Hûn ku bixwazin ez ê herim wir.

RANEVSKAYA: Çima tu wilo dixuyî? Ma qey tu nexweş î? Diviyabû tu razayîba.

FÎRS (Bi henekpêkirin): Erêê, a razanê ez ê razêm, lê kî ê li kar binihêre? Kî ê der û dorê bide hev? Di vê zirmalê de ji min pê ve kes tune ku.

YAŞA: Bi destûra te be madam, ez dixwazim pêşniyazekê bikim? Ger tu dîsan biçî Parîsê min jî bi xwe re bibe.

Li vir mayina min bêîmkan e. (Çavên xwe li dora xwe digerîne; bi dengêkî nizimtir.) Ne hewce ye ez ji te re bibêjim, ji te ve xuyaye, vir welatekî cahîl e, bi mirovên wan re exlaq tune, kultureke xav e! Xwarinên li mûtfaxê genî ne, mîna ku ev hemû têr nekin, yek jî çûyin û hatina Fîrs ya li nava lîngan û bêmanebûna peyva wî ya di ber xwe de. Ez lava dikim, min jî bi xwe re bibe!

(Pîşçîk dikeve sehnê.)

PÎŞÇÎK: Gelo te ê ev zewqa han ji min re bibexşanda... tûrrek du tûrr vals, xanima xweşik (Ranevskaya dikeve milê wî.) Xanima delal ya ku ez heyran im, bi rastî jî divê ez 180 rubleyî ji te deyn bikim. (Bi

68

danskirinê re.) Tenê 180 ruble. (Bi danskirin derbasî

hêwana mêvanan dibin.)

YAŞA (Di ber xwe de bi muzîkê re distirê).

"Ax, gelo tu ê fêhm bikî

bê dilê min çî dikişîne?"

(Li hêwana mêvanan yekî bi fotr, bi pantorê xetxetî,
dest û milên xwe dihejîne û xwe hol dike.

Dengên "bravo, Şarlotta.)

DUNYAŞA (Radiweste û rûyê xwe pudra dike): Xanima

Anya dixwaze ez dans bikim... mêr ji jinan bêtir

e. Lê gava ez dans dikim, ez gêj dibim, dilê min lê

dide. Berî kêliyekê li postexanê xortekî ji min re

tiştekek got, eynî bêhna min çikiya.

(Hêdî hêdî dengê muzîkê dadikeve.)

FÎRS: Ji te re çî got?

DUNYAŞA: Ji min re got ku ez dişibim gulekê.

YAŞA (Dibawişke): Hey cahilên cahil! (Derdikeve.)

DUNYAŞA: Gulekê! Di zarîfbûnê de tiştekekî min yê ku ji xanimjinan

kêm be tuneke, ez ji komplîmanê zehf

hez dikim.

FÎRS: Ez pêşeroja te qet baş nabînim.

(Yepîhodov dikeve sehnê.)

YEPÎHODOV: Bi dîtina min qet kêfa te nehat. Dunyaşa, tu

69

danskirinê re.) Tenê 180 ruble. (Bi danskirin derbasî

hêwana mêvanan dibin.)

YAŞA (Di ber xwe de bi muzîkê re distirê).

"Ax, gelo tu ê fêhm bikî

bê dilê min çî dikişîne?"

(Li hêwana mêvanan yekî bi fotr, bi pantorê xetxetî,
dest û milên xwe dihejîne û xwe hol dike.

Dengên "bravo, Şarlotta.)

DUNYAŞA (Radiweste û rûyê xwe pudra dike): Xanima
Anya dixwaze ez dans bikim... mêr ji jinan bêtir
e. Lê gava ez dans dikim, ez gêj dibim, dilê min lê
dide. Berî kêliyekê li postexanê xortekî ji min re
tişteş got, eynî bêhna min çikiya.

(Hêdî hêdî dengê muzîkê dadikeve.)

FÎRS: Ji te re çî got?

DUNYAŞA: Ji min re got ku ez dişibim gulekê.

YAŞA (Dibawîşke): Hey cahilên cahil! (Derdikeve.)

DUNYAŞA: Gulekê! Di zarîfbûnê de tişteş min yê ku ji xanimjinan
kêm be tune ye, ez ji komplîmanê zehf
hez dikim.

FÎRS: Ez pêşeroja te qet baş nabînim.

(Yepîhodov dikeve sehnê.)

YEPÎHODOV: Bi dîtina min qet kêfa te nehat. Dunyaşa, tu
69

dibêjî qey ez kêzîkek im. (Bêhna xwe berdide.)

Ax! Jiyan!

DUNYAŞA: Tişteş tu dixwazî çî ye?

YEPÎHODOV: Bêşik, dibe tu biheq be jî. (Bêhna xwe berdide.)

Lê ji xwe, ger mirov wilo li meselê binihêre,
wê çaxê te bi xwe -ez dixwazim bi vî awayî bînim
ziman, hêvîdar im tu ê li min negirî- ez ajotime ser
vî aqilî. Ez qedera xwe fewqelade teqdîr dikim;
her roj belayek tê serê min, lê ez hînî vê yekê bû-

me, ez bi qedera xwe re dibişirim û lê vedigerînim. Digel ku te soz daye min û min...

DUNYAŞA: Ger ji bo te tu ziyana wê tunebe, em dikanin paşê behsa van bikin, tu niha ji ba min bi dûr bikeve. Ez dixwazim bi ramanên xwe re bi tenê bimînim.

(Bi bawêşînkî xwe dileyize.)

YEPÎHODOV: Her roj belayek tê serê min, lê digel vê jî, bi destûra te be, ez bi bişirîn heta bi kenê bi pîrqîn pêrgî vê dibim.

(Varya ji hêwana mêvanan derbasîsehnê dibe.)

VARYA (Ji Yepîhodov re): Ma tu hê li vir î, Semyon? Mîna tu guh nadî tiştên ji te re têne gotin. (Ji Dunyaşayê re.) Heydê, Dunyaşa. (Ji Yepîhodov re.) Tu ê pêşî bi bîlardoyê bilîze û destik bişkîne, paşê mîna ku tu dawetkirî yî tu ê bi mêvanan re li hêwanê bigerî!

YEPÎHODOV: Li qusûrê nenihêre, lê heqê te tune ye tu hesêb ji min bixwazî.

VARYA: Ez ji te hesab naxwazim, ez bi tenê ji te re dibêjim
70

dibêjî qey ez kêzîkek im. (Bêhna xwe berdide.)

Ax! Jiyan!

DUNYAŞA: Tiştê tu dixwazî çi ye?

YEPÎHODOV: Bêşik, dibe tu biheq be jî. (Bêhna xwe berdide.)

Lê ji xwe, ger mirov wilo li meselê binihêre, wê çaxê te bi xwe -ez dixwazim bi vî awayî bînim ziman, hêvîdar im tu ê li min negirî- ez ajotime ser vî aqilî. Ez qedera xwe fewqelade teqdîr dikim; her roj belayek tê serê min, lê ez hînî vê yekê bû-

me, ez bi qedera xwe re dibişirim û lê vedigerî-
nim. Digel ku te soz daye min û min...

DUNYAŞA: Ger ji bo te tu ziyana wê tunebe, em dikanin
paşê behsa van bikin, tu niha ji ba min bi dûr bikeve.
Ez dixwazim bi ramanên xwe re bi tenê bimînim.

(Bi bawêşînkî xwe dileyize.)

YEPÎHODOV: Her roj belayek tê serê min, lê digel vê jî, bi
destûra te be, ez bi bişirîn heta bi kenê bi pîrqîn
pêrgî vê dibim.

(Varya ji hêwana mêvanan derbasîsehnê dibe.)

VARYA (Ji Yepîhodov re): Ma tu hê li vir î, Semyon? Mîna
tu guh nadî tiştên ji te re têne gotin. (Ji Dunyaşayê
re.) Heydê, Dunyaşa. (Ji Yepîhodov re.) Tu ê pêşî
bi bîlardoyê bilîze û destik bişkîne, paşê mîna ku
tu dawetkirî yî tu ê bi mêvanan re li hêwanê bigerî!

YEPÎHODOV: Li qusûrê nenihêre, lê heqê te tune ye tu hesêb
ji min bixwazî.

VARYA: Ez ji te hesab naxwazim, ez bi tenê ji te re dibêjim
70

û hew. Hemû tiştê tu dikî, tu tişteki nakî û li vê
ortê digerî; me jî tu bi niyeta katiban girtiye, Xwedê
zane bê tu bi kêrî çî tê!

YEPÎHODOV (Dilê wîmaye.) Ez dixebitim naxebitim, digirim
nagerim, dixwim naxwim, wê tenê mezinên
min û kesên ku fêhm bikin biryar bidin.

VARYA: Tu çawan cesaret dikî û bi min re wilo dipeyivî?
(Bi hêrs.) Bala xwe bidin cesaretê! Dêmek hişê
min nagihîjê, ne wilo? Tawilê, a niha, ji vir biqueşite!

Te bihîst? Taviî!

YEPÎHODOV (Bi tirs): Ez tika dikim tu ê hebekî guh bidî gotinên xwe.

VARYA (Mîna ne li ser hişê xwe be): Taviî ji vir biqêşite! Biqêşite! (Gava Yepîhodov hêdî hêdî berepaş ber bi dêrî ve dihere, Varya jî wî temaşe dike.) Bêyom! Derkeve derve û careke din jî nekeve hundur! Bila careke din çavê min bi te nekeve!

YEPÎHODOV (Piştî ji sehnê derdikeve): Ez ê di derheqa te de gilîdar bibim.

VARYA: Çi! Tu dîsan hatî? (Radihêje gopalê ku Firs hiştibû.) De ka were! De, were! De tu were ez dersa te bidime te! Ha, dêmek ru tê? A ji te re, a ji te re. (Tam gava Varya gopêl davêjîyê Lopahîn dikeve hundur.)

LOPAHÎN: Ez pir spas dikim.

VARYA (Bi hêrs, di eynî wextê de bi qerf): Bibexşîne!

LOPAHÎN: Rice dikim. Ez ji bo vê pêrgîhatina te ya germ spasdarê te me.

VARYA: Xem nake. (Gava dimeşe û diçe, radiweste, serê xwe dizîvirîne û bi dengê nermik dipirse.) Xwe-

71

û hew. Hemû tiştê tu dikî, tu tişteki nakî û li vê ortê digêrî; me jî tu bi niyeta katiban girtiye, Xwedê zane bê tu bi kêrî çi tê!

YEPÎHODOV (Dilê wîmaye.) Ez dixebitim naxebitim, digirim nagerim, dixwim naxwim, wê tenê mezinên min û kesên ku fêhm bikin biryar bidin.

VARYA: Tu çawan cesaret dikî û bi min re wilo dipeyvî?

(Bi hêrs.) Bala xwe bidin cesaretê! Dêmek hişê min nagihîjê, ne wilo? Tavlê, a niha, ji vir biqêşite!

Te bihîst? Tavlê!

YEPÎHODOV (Bi tirs): Ez tika dikim tu ê hebekî guh bidî gotinên xwe.

VARYA (Mîna ne li ser hişê xwe be): Tavlê ji vir biqêşite!

Biqêşite! (Gava Yepîhodov hêdî hêdî berepaş ber bi dêrî ve dihere, Varya jî wî temaşe dike.) Bêyom!

Derkeve derve û careke din jî nekeve hundur! Bila careke din çavê min bi te nekeve!

YEPÎHODOV (Piştî ji sehnê derdikeve): Ez ê di derheqa te de gilîdar bibim.

VARYA: Çi! Tu dîsan hatî? (Radihêje gopalê ku Firs hiştibû.)

De ka were! De, were! De tu were ez dersa te bidime te! Ha, dêmek ru tê? A ji te re, a ji te re.

(Tam gava Varya gopêl davêjîyê Lopahîn dikeve hundur.)

LOPAHÎN: Ez pir spas dikim.

VARYA (Bi hêrs, di eynî wextê de bi qerf): Bibexşîne!

LOPAHÎN: Rice dikim. Ez ji bo vê pêrgîhatina te ya germ spasdarê te me.

VARYA: Xem nake. (Gava dimeşe û diçe, radiweste, serê xwe dizîvirîne û bi dengekî nermik dipirse.) Xwe-

71

dê bike min cihekî te neêşandibe?

LOPAHIN: Na, na, tişt nebûye. Tenê wê di serê min de werimandineke mîna hêka qazekê çêbibe û hew.

(Ji hêwanê deng tên: "Lopahîn hatiye! Yermolay li virel")

PÎŞÇÎK: Bila çavên min wî bibînin, guhên min wî bibihîzin!
(Pîşçîk û Lopahîn hevdu maçî dikin.) Hebekî bêhna konyakê ji devê te tê, dosto. Lê bi rastî jî em li vir kêfê dikin.

(Ranevskaya dikeve hundur.)

RANEVSKAYA: Tu bû, Yermolay? Tu çima evqasî dereng ma? Leonîd li ku ye?

LOPAHIN: Mîrza Gayev jî bi min re hat. Ew ê kêliyêk din li vir be.

RANEVSKAYA (Bi heyecan): Erê? Firotin çêbû? De, bêje!

LOPAHÎN (Aciz e, ditirse ku dilşahiya xwe eşkere bike.) Firotin saet di çaran de xelas bû. Ji ber ku em ji trê-nê man, em mecbûr man li bendî trêna neh û nîvan rawestin. (Bêhneke kûr berdide.) Serê min hinekî gêj dibe.

(Gayev dikeve sehnê. Di destê wî yê rastê de tibabek pakêt hene, bi destê xwe yê çepê jî hêsirên xwe pakij dike.)

RANEVSKAYA: Erê, Leonîd? De, bêje! (Bêsebir, diqîre.) Zû

72

dê bike min cihekî te neêşandibe?

LOPAHIN: Na, na, tişt nebûye. Tenê wê di serê min de werimandineke mîna hêka qazekê çêbibe û hew.

(Ji hêwanê deng tên: "Lopahîn hatiye! Yermolay li virel")

PÎŞÇÎK: Bila çavên min wî bibînin, guhên min wî bibihîzin!

(Pîşçîk û Lopahîn hevdu maçî dîkin.) Hebekî bêhna konyakê ji devê te tê, dosto. Lê bi rastî jî em li vir kêfê dîkin.

(Ranevskaya dikeve hundur.)

RANEVSKAYA: Tu bû, Yermolay? Tu çima evqasî dereng ma? Leonîd li ku ye?

LOPAHIN: Mîrza Gayev jî bi min re hat. Ew ê kêliyêk din li vir be.

RANEVSKAYA (Bi heyecan): Erê? Firotin çêbû? De, bêje!

LOPAHÎN (Aciz e, ditirse ku dilşahiya xwe eşkere bike.) Firotin saet di çaran de xelas bû. Ji ber ku em ji trê-nê man, em mecbûr man li bendî trêna neh û nîvan rawestin. (Bêhneke kûr berdide.) Serê min hinekî gêj dibe.

(Gayev dikeve sehnê. Di destê wî yê rastê de tibabek pakêt hene, bi destê xwe yê çepê jî hêsirên xwe pakij dike.)

RANEVSKAYA: Erê, Leonîd? De, bêje! (Bêsebir, diqîre.) Zû

72
bêje, ji bo Xwedê zû bêje!

GAYEV (Bi hereketêke desta bersivê dide wî, digirî, ji Fîrs re): Van bigire. Hinek anjovîs e û hinek jî masiyên dagirtî ne. Min hemû rojê tiştêk nexwariye. Ya Rebî, min çi kişand! (Ji deriyê vekirî yê hêwana bîlardoyê dengê topan û dengê Yaşa tê bihîstin: " Heft, hîşjdeh!" Rengê rûyê Gayev tê guhertin; giriyê xwe dibire.) Ez pir westiyame. Were alîkariya min bike da ez kincên xwe biguherim, Fîrs. (Ji hê-

wanê derbasî odeya xwe ya razanê dibe. Fîrs jî didedû wî.)

PÎŞÇÎK: Ji firotinê çi xeber heye? Heydê!

RANEVSKAYA: Ma bexçê vîşne hate firotin?

LOPAHÎN: Erê.

RANEVSKAYA: Kê kirî?

LOPAHÎN: Min kirî. (Kurtebêdengiyek.) (Gava Ranevskaya ew nûçe bihîst, mîna ku birûsk lê ketibe. Ji bo nekeve, xwe bi kursî û masa li ba xwe digire. Varya, xeleka miftan ji ber pişta xwe derdixe, davêje erdê û ji sehnê derdikeve.) Min kirî. Deqîqeyekê rawestin, li serê min kom nebin, ez gêj dibim... zimanê min nagere. (Bi ken.) Gava em çûn mazatê Derîganov li wir bû. Bi tenê 15 000 ribleyên mîrza Gayev hebû, herçî Derîganov bû, bi carekê ve got 30 000 rible, yanî bi ser îpotekê ket. Vê carê, ez bi ser ve çûm û min 40 000 got. Wî derxist 45 000'an, min got 55 000. Bi wî awayî wî pênc û pênc, min jî deh û deh lê zêde kir û me dewam kir. Di dawî de xelas bû. Di ser deynê îpotekê re min 90 000'ê din jî da, kirîn jî li ser min ma. Niha êdî

73

bêje, ji bo Xwedê zû bêje!

GAYEV (Bi hereketeke desta bersivê dide wî, digirî, ji Fîrs re): Van bigire. Hinek anjovîs e û hinek jî masiyên dagirtî ne. Min hemû rojê tiştê nexwariye. Ya Rebî, min çi kişand! (Ji deriyê vekirî yê hêwana

bîlardoyê dengê topan û dengê Yaşa tê bihîstin: " Heft, hîşjdeh!" Rengê rûyê Gayev tê guhertin; giriyê xwe dibire.) Ez pir westiyame. Were alîkariya min bike da ez kincên xwe biguherim, Fîrs. (Ji hêwanê derbasî odeya xwe ya razanê dibe. Fîrs jî didedû wî.)

PÎŞÇÎK: Ji firotinê çi xeber heye? Heydê!

RANEVSKAYA: Ma bexçê vîşne hate firotin?

LOPAHÎN: Erê.

RANEVSKAYA: Kê kirî?

LOPAHÎN: Min kirî. (Kurtebêdengiyek.) (Gava Ranevskaya ew nûçe bihîst, mîna ku birûsk lê ketibe. Ji bo nekeve, xwe bi kursî û masa li ba xwe digire. Varya, xeleka miftan ji ber pişta xwe derdixe, davêje erdê û ji sehnê derdikeve.) Min kirî. Deqîqeyekê rawestin, li serê min kom nebin, ez gêj dibim... zimanê min nagere. (Bi ken.) Gava em çûn mazatê Derîganov li wir bû. Bi tenê 15 000 rubleyên mîrza Gayev hebû, herçî Derîganov bû, bi carekê ve got 30 000 ruble, yanî bi ser îpotekê ket. Vê carê, ez bi ser ve çûm û min 40 000 got. Wî derxist 45 000'an, min got 55 000. Bi wî awayî wî pênc û pênc, min jî deh û deh lê zêde kir û me dewam kir. Di dawî de xelas bû. Di ser deynê îpotekê re min 90 000'ê din jî da, kirîn jî li ser min ma. Niha êdî

73
bexçeyê vîşne yê min e! Yê min e! (Bi pîrçîn dikene.)

Xwedêyo! Bexçê vîşne yê min e! Ji min re bê-

jin ku ez serxweş im, min serê xwe winda kiriye,
ev hemû xewn e. (Lingê xwe li erdê dide.) Bi min
nekenin! Ax, xwezî bav û kalê min ji gorên xwe
rabûna û ev hemû bidîtana bê çawan Yermolayê
wan, Yermolayê reben û cahil, ku zivistanan pêxwas
digeriya -bê çawan wî Yermolayî ji xwe re
milkek kirî ye. Ez di xewekê de me, ev xewn e, ne
rastî ye... Ev xeyaleke ku di siya cehaleta min de
dixuye. (Radihîje xeleka mifteyên li erdê, bi dilşahîdibişire.)
Ji bo ew nîşan bide ku ew êdî hew xatûna
vir e, wê mifte avêtin. (Mifteyan bi şingînî dihejîne.)
Em çi bikin, bila wilo be. (Dengê akordên
muzîkkaran tê.) Hê, muzîkkarno, lê xin! Ez dixwazim
li we guhdarî bikim. Heydê, hûn hemû werin.
Werin û li Yermolay Lopahînê ku bivir di dest
de ye û di nava bexçeyê vîşne de ye, temaşe bikin.
Werin û temaşe bikin bê çawan dar werdigerin!
Em ê li vir xaniyan çêbikin, wê neviyên me, nevî-
çirkên me bigihîjin jiyaneke nû. Bila muzîk lêbikeve!
(Orkestra dest bi lêdana muzîkê dike. Ranevskaya
li ser qoltixekê rûdine û bi îske îsk digirî.)
LOPAHÎN (Bi sitem): Ax, çima, çima te li min guhdarî nekir?
Tu hew dikanî bi paş ve bistînî, ezîza min a
reben. (Bi çavên tijî hêsir.) Ax, ger ev hemû tişt di
paşerojê de bimaya, ev jiyana me ya ku ser û bin
bûye, bihata guhertin!
PÎŞÇÎK (Bi milên wt digire û bi dengê nizim): Madam Ranevskaya
digirî. Heydê em derbasî hêwanê bibin û

bexçeyê vîşne yê min e! Yê min e! (Bi pîrqîn dikene.)
 Xwedêyo! Bexçê vîşne yê min e! Ji min re bê-
 jin ku ez serxweş im, min serê xwe winda kiriye,
 ev hemû xewn e. (Lingê xwe li erdê dide.) Bi min
 nekenin! Ax, xwezî bav û kalê min ji gorên xwe
 rabûna û ev hemû bidîtana bê çawan Yermolayê
 wan, Yermolayê reben û cahil, ku zivistanan pêxwas
 digeriya -bê çawan wî Yermolayî ji xwe re
 milkek kirî ye. Ez di xewekê de me, ev xewn e, ne
 rastî ye... Ev xeyaleke ku di siya cehaleta min de
 dixuye. (Radihîje xeleka mifteyên li erdê, bi dilşahîdibişire.)
 Ji bo ew nîşan bide ku ew êdî hew xatûna
 vir e, wê mifte avêtin. (Mifteyan bi şingînî dihejîne.)
 Em çî bikin, bila wilo be. (Dengê akordên
 muzîkkaran tê.) Hê, muzîkkarno, lê xin! Ez dixwazim
 li we guhdarî bikim. Heydê, hûn hemû werin.
 Werin û li Yermolay Lopahînê ku bivir di dest
 de ye û di nava bexçeyê vîşne de ye, temaşe bikin.
 Werin û temaşe bikin bê çawan dar werdigerin!
 Em ê li vir xaniyan çêbikin, wê neviyên me, nevî-
 çirkên me bigihîjin jiyaneke nû. Bila muzîk lêbikeve!
 (Orkestra dest bi lêdana muzîkê dike. Ranevskaya
 li ser qoltixekê rûdine û bi îske îsk digirî.)
 LOPAHÎN (Bi sitem): Ax, çima, çima te li min guhdarî nekir?
 Tu hew dikanî bi paş ve bistînî, ezîza min a
 reben. (Bi çavên tijî hêsir.) Ax, ger ev hemû tişt di
 paşerojê de bimaya, ev jiyana me ya ku ser û bin

bûye, bihata guhertin!

PÎŞÇÎK (Bi milên wt digire û bi dengê nizim): Madam Ranevskaya digirî. Heydê em derbasî hêwanê bibin û

74

wê bi tenê bihêlin. Heydê, werin. (Bi milê Lopahîn digire û ber bi hêwanê ve diçin.)

LOPAHÎN: Çi bûye? Stranên xwe yên herî xweş lê xin, muzîkkarno!

Wê her tiş weke ez dixwazim bibe! (Bi qerf.) Xwediyê malê yê nû tê, Xwediyê bexçeyê vîşne yê nû! (Bêhemdî li masê diqelibe û tu namtne ku mûmdanka li ser masê wergere.) Guh medinê, bila wergere, ez dikanim pereyên hemû tiştî bidim! (Ew bi Pîşçîk re ji sehnê derdikeve. Di sehnê de û di hêwanê de ji bilî Ranevskayaya ku bi îskîn digiriya, kesek namîne. Orkestra hêdî hêdî lê dide.

Anyaya û Trofîmof bi lez dikevin sehnê. Anyaya diçe ba diya xwe û li ber wê li ser çongan rûdine. Trofîmofli ber deriyê hêwanê rawestiyaye.)

ANYA: Yadê! ma tu digirî, yadê? Diya min a şîrîn, diya min a xweşik, diya min a delal! Diya min a xweşik, ez ji te hez dikim! Xwedê kederê nede te? Bexçeyê vîşne hate firotin, çû, rast e, hemû rast in. Lê çê dibe, megrî dayika min! Hê li pêşiya te jiyaneke heye, bila canê te sax be. Bi min re were -were em herin, em ji vir bi dûr bikevin. Em ê bexçeyekî ji vî xweşiktir çêbikin. Tu ê bibînî û wê hemû ruhê te şa bibe- wê ruhê te mîna roja ku diçe ava bi huzûr û şa be û tu ê bibişîrî dayika min. Heydê, cana

min, bi min re were!

PERDE

75

wê bi tenê bihêlin. Heydê, werin. (Bi milê Lopahîn digire û ber bi hêwanê ve diçin.)

LOPAHÎN: Çi bûye? Stranên xwe yê herî xweş lê xin, muzîkkarno!

Wê her tiş weke ez dixwazim bibe! (Bi qerf.) Xwediyê malê yê nû tê, Xwediyê bexçeyê vîşne yê nû! (Bêhemdî li masê diqelibe û tu namtne ku mûmdanka li ser masê wergere.) Guh medinê, bila wergere, ez dikanim pereyên hemû tiştî bidim! (Ew bi Pîşçîk re ji sehnê derdikeve. Di sehnê de û di hêwanê de ji bilî Ranevskayaya ku bi îskîn digiriya, kesek namîne. Orkestra hêdî hêdî lê dide.

Anyaya û Trofîmof bi lez dikevin sehnê. Anyaya diçe ba diya xwe û li ber wê li ser çongan rûdine. Trofîmofli ber deriyê hêwanê rawestiyaye.)

ANYA: Yadê! ma tu digirî, yadê? Diya min a şîrîn, diya min a xweşik, diya min a delal! Diya min a xweşik, ez ji te hez dikim! Xwedê kederê nede te? Bexçeyê vîşne hate firotin, çû, rast e, hemû rast in. Lê çê dibe, megrî dayika min! Hê li pêşiya te jiyaneke heye, bila canê te sax be. Bi min re were -were em herin, em ji vir bi dûr bikevin. Em ê bexçeyekî ji vî xweşiktir çêbikin. Tu ê bibînê û wê hemû ruhê te şa bibe- wê ruhê te mîna roja ku diçe ava bi huzûr û şa be û tu ê bibişîrî dayika min. Heydê, cana min, bi min re were!

PERDE

75

PERDEYA ÇAREMÎN

(Sehneyeke mîna ya yekemîn e. Ne bi pencereyan ve perde hene, ne jî bi dîwaran ve resim. Hin hûr mûrên din ku hene mîna yên mazatê hemû li quncikekê avêtîser hev in. Hewayeke bêdengiyê heye.

Li pişt sehnê, li ber deriyê dawiyê, sindoq, bahol û tiştên din hene. Deriyê milê çepê vekirî ye û dengê Anya û Varya tê bihîstin. Lopahîn li ser lingan rawestiyaye. Di destê Yaşa de tebsiyek heye, li ser tepsiyê qedehên tijî şampanya hene. Yepîhodov li antre qutiyekê girê dide. Dengin ku nayê fêhmkirin ji pişt sehnê tête bihîstin; gundî hatine wan bi rê bikin.)

GAYEV (Ji derveyî sehnê): Ez spas dikim, dostino, ez spas dikim.

YAŞA: Gundî hatine ji we re bêjin, oxir be. Bi raya min, mîrza Lopahîn, ev mirovên qenc in, lê nezan in.

(Dengê mirovan yê mîna xubxubê tê birrîn. Ranevskaya û Gayev ji antre dikevin sehnê. Digel ku ranevskaya nagirîjî, rûyê wê zer e, dilerize û nikane bipeyive.)

76

PERDEYA ÇAREMÎN

(Sehneyeke mîna ya yekemîn e. Ne bi pencereyan ve perde hene, ne jî bi dîwaran ve resim. Hin hûr mûrên din ku hene mîna yên mazatê hemû li quncikekê

avêtîser hev in. Hewayeke bêdengiyê heye.
Li pişt sehnê, li ber deriyê dawiyê, sindoq, bahol û
tiştên din hene. Deriyê milê çepê vekirî ye û dengê
Anya û Varya tê bihîstin. Lopahîn li ser lingan rawestiyaye.
Di destê Yaşa de tebsiyek heye, li ser
tepsiyê qedehên tijî şampanya hene. Yepîhodov li
antre qutiyekê girê dide. Dengin ku nayê fêhmkirin
ji pişt sehnê tête bihîstin; gundî hatine wan bi
rê bikin.)

GAYEV (Ji derveyî sehnê): Ez spas dikim, dostino, ez spas
dikim.

YAŞA: Gundî hatine ji we re bêjin, oxir be. Bi raya min,
mîrza Lopahîn, ev mirovên qenc in, lê nezan in.
(Dengê mirovan yê mîna xubxubê tê birrîn. Ranevskaya
û Gayev ji antre dikevin sehnê. Digel ku
ranevskaya nagirîjî, rûyê wê zer e, dilerize û nikane
bipeyive.)

76

GAYEV: Luba, te cûzdanê xwe yê peran hemû da wan. Lê
evqas jî nabe, canê min.

LOPAHÎN: Min nikanîbû tiştêkî din bikira, min nikanîbû.

RANEVSKAYA (Heta ber derî tê û ji pişt ve bang wan dike):

Gelo bi xatirxwestinê re te qedehek venedixwar?

Ji kerema xwe re. Tenê qedehekê. Min ji bîr
kiribû ku ez ji bajêr bikirim, li stasyonê jî min bi
tenê dikarîbû şûşeyek peyda bikira. Ez lava dikim
were. (Kurtebêdengiyek.) Çawa, ma tu venaxwî?
(Ji ber derî bi paş ve vedigere.) Min zanîbûya min

qet nedikirî. Wilo be ez jî venaxwim. (Yaşa bi dî-
qet tepsiyê datîne ser maseyekê.) Tu vexwe, Yaşa.

YAŞA: Noş, ji bo çûyina me! Yên dimînin jî şansê wan vekirî
bin! (Vedixwe.) Ev ne şampanyaya qenc e, bawer
bike ne ya qenc e.

LOPAHIN: Şûşa wê bi heşt rubleyan e. (Kurtebêdengiyek.)
Vir jî çiqas sar e.

YAŞA: Ji ber ku em ê hemû herin, min îro sobe daneda. (Dikene.
)

LOPAHÎN: Çima tu dikenî?

YAŞA: Qet, ji xwe.

LOPAHÎN: Digel ku em di meha cotmehê de ne, sayî ye û
mîna havînê roj derketiye. Tam dema çêkirina
avahiyên e. (Li saeta xwe dinihêre û ji derî de
bangî derve dike.) Ez di bîra we de tînim ku ji rabûna
trênê re bi tenê çil û heft deqîqe maye. Divê
heta bîst deqîqeyan em biçin stastonê. Ecele bikin.
(Ji derve, bi paltoyê xwe diçe ba Trofîmov.)

77

GAYEV: Luba, te cûzdanê xwe yê peran hemû da wan. Lê
evqas jî nabe, canê min.

LOPAHÎN: Min nikanîbû tiştekî din bikira, min nikanîbû.

RANEVSKAYA (Heta ber derî tê û ji pişt ve bang wan dike):

Gelo bi xatirxwestinê re te qedehek venedixwar?

Ji kerema xwe re. Tenê qedehekê. Min ji bîr

kiribû ku ez ji bajêr bikirim, li stasyonê jî min bi

tenê dikarîbû şûşeyek peyda bikira. Ez lava dikim

were. (Kurtebêdengiyek.) Çawa, ma tu venaxwî?

(Ji ber derî bi paş ve vedigere.) Min zanîbûya min qet nedikirî. Wilo be ez jî venaxwim. (Yaşa bi dî-qet tepsiyê datîne ser maseyekê.) Tu vexwe, Yaşa.

YAŞA: Noş, ji bo çûyina me! Yê dimînin jî şansê wan vekirî bin! (Vedixwe.) Ev ne şampanyaya qenc e, bawer bike ne ya qenc e.

LOPAHIN: Şûşa wê bi heşt rubleyan e. (Kurtebêdengiyek.) Vir jî çiqas sar e.

YAŞA: Ji ber ku em ê hemû herin, min îro sobe daneda. (Dikene.)

LOPAHÎN: Çima tu dikenî?

YAŞA: Qet, ji xwe.

LOPAHÎN: Digel ku em di meha cotmehê de ne, sayî ye û mîna havînê roj derketiye. Tam dema çêkirina avahiyên e. (Li saeta xwe dinihêre û ji derî de bangî derve dike.) Ez di bîra we de tînim ku ji rabûna trêna re bi tenê çil û heft deqîqe maye. Divê heta bîst deqîqeyan em biçin stastonê. Ecele bikin. (Ji derve, bi paltoyê xwe diçe ba Trofîmov.)

77

TROFÎMOV: Divê wextê trêna hatibe. Erebe li vir in. Ev galoşên min bi ku de cehemîn? min galoşên xwe wînda kirin. (Bangî derve dike.) Anya, galoşên min ne li vir in. Ez wan nabînim!

LOPAHÎN: Ez jî divê herim Harkovayê. Ez ê bi trêna we herim. Ez dixwazim zivistana xwe li Harkovayê bibuhurînim. Ez bi taqalê we ketim û demeke dirêj bêkar mam, ez ji bêkariyê teqiyam. Ger ez kar

nekim debara min nayê, ez nizanim ez ê çî bikim
ji van destên xwe... Gava ez bi tiştê re mijûl nabim,
mîna ku herdu destên min ne yê min in, ew
wilo bi min ve dadiliqin û dihejin.

TROFÎMOV: Eh, va ye em diçin, tu ê jî bi hêsanî vegeerî ser
karê xwe yê bi ber.

LOPAHÎN: Rahêje qedehê.

TROFÎMOV: Na, spas.

LOPAHÎN: Ee, dêmek hûn diçin Moskovayê?

TROFÎMOV: Erê, ez ê herim bajêr wan bi rê bikim, sibehê
jî ez herim Moskovayê.

LOPAHÎN: Êê, divê niha profesoran jî dest bi dersên xwe
kiribin, ew bi çar çavan li bendî hatina te ye.

TROFÎMOV: Ew te eleqeder nake.

LOPAHÎN: Çend sal çêbûne ku tu ketiyî unîversîteyê?

TROFÎMOV: Hebekî serê xwe bişuxulîne û henekeke din
bibîne -ev êdî kevn bûye, hem jî genî bûye. (Li galoşên
xwe digere.) Binêre, herhel êdî em ê hevdu
nebînin, ji ber vê yekê, ez dixwazim li ser lingan
şîretekê li te bikim: Wilo milên xwe nehejîne û raneweste-
dev ji vê adeta xwe berde. Ê çêkirina havîngehan,
yek jê jî dev ji vê fikra ku wê rojekê

78

TROFÎMOV: Divê wextê trêne hatibe. Erebe li vir in. Ev galoşên
min bi ku de cehemîn? min galoşên xwe
winda kirin. (Bangî derve dike.) Anya, galoşên
min ne li vir in. Ez wan nabînim!

LOPAHÎN: Ez jî divê herim Harkovayê. Ez ê bi trêna we

herim. Ez dixwazim zivistana xwe li Harkovayê bibuhurînim. Ez bi taqalê we ketim û demeke dirêj bêkar mam, ez ji bêkariyê teqiyam. Ger ez kar nekim debara min nayê, ez nizanim ez ê çi bikim ji van destên xwe... Gava ez bi tiştê re mijûl nabim, mîna ku herdu destên min ne yên min in, ew wilo bi min ve dadiliqin û dihejin.

TROFÎMOV: Eh, va ye em diçin, tu ê jî bi hêsanî vegerî ser karê xwe yê bi ber.

LOPAHÎN: Rahêje qedehekê.

TROFÎMOV: Na, spas.

LOPAHÎN: Ee, dêmek hûn diçin Moskovayê?

TROFÎMOV: Erê, ez ê herim bajêr wan bi rê bikim, sibehê jî ez herim Moskovayê.

LOPAHIN: Êê, divê niha profesoran jî dest bi dersên xwe kiribin, ew bi çar çavan li bendî hatina te ye.

TROFÎMOV: Ew te eleqeder nake.

LOPAHÎN: Çend sal çêbûne ku tu ketiyî unîversîteyê?

TROFÎMOV: Hebekî serê xwe bişuxulîne û henekeke din bibîne -ev êdî kevn bûye, hem jî genî bûye. (Li galoşên xwe digere.) Binêre, herhel êdî em ê hevdu nebînin, ji ber vê yekê, ez dixwazim li ser lingan şiretekê li te bikim: Wilo milên xwe nehejîne û raneweste-
dev ji vê adeta xwe berde. Ê çêkirina havîngehan,
yek jê jî dev ji vê fikra ku wê rojekê

78

xwediyê van havîngehan jî bibin xwediyê erdan,
berde. Her çawan be, ez dîsan jî ji te hez dikim.

Tiliyên te yê n zarav û narîn mîna yê hunermendekî ne, ruhê te pak û hesas e. LOPAHÎN (Wî hemêz dike): Oxir be, xortê min yê ezîz. Ez

ji bo her tiştî spas dikim. Ger ji bo rêwîtiya te pere lazim bin, ez dikarim hinekî bidim te.

TROFIMOV: Ew çima? Ez naxwazim.

LOPAHÎN: Lê perê te tune.

TROFÎMOV: Heye, heye. Pir spas dikim. Min ji bo wergereke xwe hinek pere standibû. Ev e, di bêrîka min de ye. (Bi telaş dibe.) Yaho, ez dikim nakim ez nikanim galoşên xwe bibînim!

VARYA (Ji odeya kêlekê): A ji te re, vane galoşên te yê kevin. (Cotek galoş davêje nava sehnê.)

TROFÎMOV: Çima tu evqasî bi hêrs î, Varya? Hi!... Ev galoşên han ne yê min in ku!

LOPAHÎN: Min biharê panzdeh hezar donim heşîş çandibû, min çil hezar rubleyên pakij kar kir. Lê, gava ev heşîş gul vedidin, çi dêmeneke wê ya xweş heye! Ha, min digot, ku min çil hezar ruble qezenc kir, yanî ji ber ku perê min heye, ez dixwazim hinekî jê bidim te! Çima tu wilo pozê xwe dadiliqînî? Ez peyakî gundî me, ez bi mêranî dipeyivim...

TROFÎMOV: Bavê te gundî bû, yê min kîmyager e, lê ev tiştêkî îspat nake. (Lopahîn cûzdanê xwe derdixe.)

Wî têxe cê wî. Ger tu dused hezar rubleyî jê bidî min ez dîsan naxwazim. Ez mirovekî azad im, hûn bi dewlemend û belengazên xwe nikanin tesîreke biçûk jî li min bikin. Ev hemû ji min re hîç

xwedyê van havîngehan jî bibin xwedyê erdan,
berde. Her çawan be, ez dîsan jî ji te hez dikim.

Tiliyên te yê zirav û narîn mîna yê hunermendekî
ne, ruhê te pak û hesas e. LOPAHÎN (Wî hemêz dike): Oxir be, xortê min
yê ezîz. Ez

ji bo her tiştî spas dikim. Ger ji bo rêwîtiya te pere
lazim bin, ez dikarim hinekî bidim te.

TROFIMOV: Ew çima? Ez naxwazim.

LOPAHÎN: Lê perê te tune.

TROFÎMOV: Heye, heye. Pir spas dikim. Min ji bo wergereke
xwe hinek pere standibû. Ev e, di bêrîka min
de ye. (Bi telaş dibe.) Yaho, ez dikim nakim ez nikanim
galoşên xwe bibînim!

VARYA (Ji odeya kêlekê): A ji te re, vane galoşên te yê kevin.
(Cotek galoş davêje nava sehnê.)

TROFÎMOV: Çima tu evqasî bi hêrs î, Varya? Hi!... Ev galoşên
han ne yê min in ku!

LOPAHÎN: Min biharê panzdeh hezar donim heşîş çandibû,
min çil hezar rubleyên pakij kar kir. Lê, gava ev
heşîş gul vedidin, çi dêmeneke wê ya xweş heye!
Ha, min digot, ku min çil hezar ruble qezenc kir,
yanî ji ber ku perê min heye, ez dixwazim hinekî
jê bidim te! Çima tu wilo pozê xwe dadiliqînî? Ez
peyakî gundî me, ez bi mêranî dipeyivim...

TROFÎMOV: Bavê te gundî bû, yê min kîmyager e, lê ev
tiştêkî îspat nake. (Lopahîn cûzdanê xwe derdixe.)

Wî têxe cê wî. Ger tu dused hezar rubleyî jî

bidî min ez dîsan naxwazim. Ez mirovekî azad im,
hûn bi dewlemend û belengazên xwe nikanin tesî-
reke biçûk jî li min bikin. Ev hemû ji min re hîç

79

in... Tu jî hîç î... Ez ê milên xwe bihejînim û herim
û werim, ez mirovekî birûmet û serbilind im.

Mirovatî ber bi rastiya herî berz ve diçe, ber bi dil-
şahiya herî berz ya li ser rûyê dinyayê dimeşe û ez
jî di pêşiyê de me.

LOPAHÎN: Û tu difikirî bigihîjî armanca xwe?

TROFÎMOV: Erê. (Kurtebêdengiyek.) Ez ê bigihîjim armanca
xwe, an jî ez ê rê nîşanî hinin din bidim.

(Ji dûr ve, dengê bivirê ku daran dibirre tête bihîstin.)

LOPAHÎN: Eh, wê çaxê oxir be, dostê min; êdî wextê çûyinê
ye. Em li vir li dijî hev radibin, lê jiyana tê û dibuhure.

Gava ez bi saetan bê rawestan dixebitim,
serê min rehetir e, mîna ku ez wê çaxê sebaba hebûna
baştir têdigihêm. Lê li vê Rûsyayê gelek însan
hene, ku anca Xwedê zanibe bê ew ji bo çî
hatine vê dinyayê. Guh mediyê, ji kê re çî? Li gorî
min bihîst, mîrza Gayev, li bankeyeke ku salê
6000 ruble tîne, karek qebûl kiriye. Lê wê zêde
dom neke, ew pir tiral e.

ANYA (Ji devê derî): Yadê, heta ew here, ez ji we rice dikim
ku hûn ê birrîna daran bidin rawestandî.

TROFÎMOV: Bi rastî jî, diviyabû te hebekî guh bidayê.

(Derbasî antre dibe.)

LOPAHÎN: Bi rastî. Ez ê tavilê wan bidime rawestandî.

Ho gêjikno! (Derdikeve.)

ANYA: Gelo Fîrs birin nexweşxanê?

YAŞA: Min vê sibehê ji wan re got, wî bibin. Herhal ew
80

in... Tu jî hîç î... Ez ê milên xwe bihejînim û herim
û werim, ez mirovekî birûmet û serbilind im.

Mirovatî ber bi rastiya herî berz ve diçe, ber bi dil-
şahiya herî berz ya li ser rûyê dinyayê dimeşe û ez
jî di pêşiyê de me.

LOPAHÎN: Û tu difikirî bigihîjî armanca xwe?

TROFÎMOV: Erê. (Kurtebêdengiyek.) Ez ê bigihîjim armanca
xwe, an jî ez ê rê nîşanî hinin din bidim.

(Ji dûr ve, dengê bivirê ku daran dibirre tête bihîstin.)

LOPAHÎN: Eh, wê çaxê oxir be, dostê min; êdî wextê çûyinê
ye. Em li vir li dijî hev radibin, lê jiyana tê û dibuhure.

Gava ez bi saetan bê rawestan dixebitim,
serê min rehetir e, mîna ku ez wê çaxê sebaba hebûna
baştir têdigihêm. Lê li vê Rûsyayê gelek însan
hene, ku anca Xwedê zanibe bê ew ji bo çî
hatine vê dinyayê. Guh mediyê, ji kê re çî? Li gorî
min bihîst, mîrza Gayev, li bankeyeke ku salê
6000 ruble tîne, karek qebûl kiriye. Lê wê zêde
dom neke, ew pir tiral e.

ANYA (Ji devê derî): Yadê, heta ew here, ez ji we rice dikim
ku hûn ê birrîna daran bidin rawestandin.

TROFÎMOV: Bi rastî jî, diviyabû te hebekî guh bidayê.

(Derbasî antre dibe.)

LOPAHÎN: Bi rastî. Ez ê tavlê wan bidime rawestandin.

Ho gêjikno! (Derdikeve.)

ANYA: Gelo Fîrs birin nexweşxanê?

YAŞA: Min vê sibehê ji wan re got, wî bibin. Herhal ew

80

şandine.

ANYA (Ji Yepîhodovê ku di hêwanê re derbas dibe re): Ka ji

kerema xwe re lêbikole bê Fîrs birine nexweşxanê

an na. YAŞA (Bi dilmayin): Min vê sibehê ji Yegor re got. Bêfêde

ye.

YEPÎHODOV: Li gorî baweriya min, tu fêda doktor û nexweşxaneyan

êdî nagihîje Fîrsê kal; dema ku ew bigihîje

heqê xwe hatiye. Ya rastî ez ji wî didexisim.

(Radihîje sindoqekê, datîne ser qutiya karton a

şevqe û qutiya şevqe bi erdê ve dizeliqîne.) Ha, ev

e! Ez dizanim çi tê serê min! (Derdikeve.)

YAŞA (Bi qerf): Bêyom!

VARYA (Ji derveyî sehnê): Ma Fîrs birin nexweşxanê?

ANYA: Erê.

VARYA: Çima nota ku ji doktor re hatiye nivîsandin, nebirine?

ANYA: Ha, wê çaxê ez ê tavilê bişînim. (Ji sehnê derdikeve.)

VARYA (Ji odeya kêlekê): Yaşa li ku ye? Ji wî re bêjin diya

wî hatiye da jê re bêje oxir be.

YAŞA (Bi jesteke ku bêtehamultî nîşan dida): Sînorekî sebra

mirovan heye.

(Dunyaşa bi bagajan mijûl e. Gava ew û Yaşa bi

tenê dimînin, nêzîkî wî dibe.)

DUNYAŞA: Qet nebe, carek bûya jî te dikarîbû li min binihêriya,

Yaşa. Tu min dihêlî û diçî. (Dest bi girî dike

û xwe davêje stûyê Yaşa.)

YAŞA: Tu fêda girî tune. (Şampanya vedixwe.) Ez ê ji ni-

81

şandine.

ANYA (Ji Yepîhodovê ku di hêwanê re derbas dibe re): Ka ji

kerema xwe re lêbikole bê Fîrs birine nexweşxanê

an na. YAŞA (Bi dilmayin): Min vê sibehê ji Yegor re got. Bêfêde

ye.

YEPÎHODOV: Li gorî baweriya min, tu fêda doktor û nexweşxaneyan

êdî nagihîje Fîrsê kal; dema ku ew bigihîje

heqê xwe hatiye. Ya rastî ez ji wî didexisim.

(Radihîje sindoqekê, datîne ser qutiya karton a

şevqe û qutiya şevqe bi erdê ve dizeliqîne.) Ha, ev

e! Ez dizanim çî tê serê min! (Derdikeve.)

YAŞA (Bi qerf): Bêyom!

VARYA (Ji derveyî sehnê): Ma Fîrs birin nexweşxanê?

ANYA: Erê.

VARYA: Çima nota ku ji doktor re hatiye nivîsandin, nebirine?

ANYA: Ha, wê çaxê ez ê tavilê bişînim. (Ji sehnê derdikeve.)

VARYA (Ji odeya kêlekê): Yaşa li ku ye? Ji wî re bêjin diya

wî hatiye da jê re bêje oxir be.

YAŞA (Bi jêsteke ku bêtehamultî nîşan dida): Sînorekî sebra

mirovan heye.

(Dunyaşa bi bagajan mijûl e. Gava ew û Yaşa bi

tenê dimînin, nêzîkî wî dibe.)

DUNYAŞA: Qet nebe, carek bûya jî te dikarîbû li min binihêriya,

Yaşa. Tu min dihêlî û diçî. (Dest bi girî dike

û xwe davêje stûyê Yaşa.)

YAŞA: Tu fêda girî tune. (Şampanya vedixwe.) Ez ê ji ni-
81

ha û deh rojan dîsan li Parîsê bim. Sibehê jî em ê li
ekspresê siwar bibin û êdî hew kes dikare me bigire.
Ez bawer nakim. Vive la France! Ev der ne li
gorî min e canê min. Ji dilê min nayê, ez çî bikim,
ne di destê min de ye. Ev cehaleta ku min li vir dît
têr dike. (Şampanya vedixwe.) Niha çî fêda giriyê
te heye? Hebekî bi ser xwe ve were, wê çaxê tu ê
nexwazibî bigirî.

DUNYAŞA (Li neynika xwe a bêrîkan dinihêre û rûyê xwe
podra dike): Li Parîsê ji min re binivîsîne. Ez ewqasî
bi te ve hatibûm girêdan, Yaşa, ez ewqasî hatibûm
girêdan ku! Ez mirovekî pir hesas im, Yaşa.

YAŞA: Yek tê. (Bi dengê nizim ji xwe re stranekê dinuhurîre
û mîna ku bi bagajan ve mijûl e, dike.)

(Ranevskaya, Gayev û Şarlotta dikevin sehnê.)

GAYEV: Em bi rê bikevin? Êdî wext e. (Li Yaşa dinihêre.)
Bîna masî ji kê tê?

RANEVSKAYA: Divê em piştî deh deqîqeyên din cihê xwe
bigirin. (Çavên xwe li odê digêrin.) Bi xatirê te
mala me ya xweşik, di xweşiyê de bimîne, kalikê
me! Gava zivistan derbas be û dîsan bihar were,
êdî tu ê ne li vir bî; Wê te hilweşînin. Ax, ger zimanê
van dîwaran hebûya û bipeyiviyana! (Bi coş
Anyayê maçîdike.) Gencîneya min, tu dibiriqî, çavên
te mîna du elmasan şewq didin. Ma tu dilşa
yî? Ma tu gelekî dilşa yî?

ANYA: Erê, Em dest bi jiyaneke nû dikin, yadê.

GAYEV (Bi şahî): Rast e, êdî her tişt kete rê. Berî ku bexçê

82

ha û deh rojan dîsan li Parîsê bim. Sibehê jî em ê li ekspresê siwar bibin û êdî hew kes dikare me bigire.

Ez bawer nakim. Vive la France! Ev der ne li gorî min e canê min. Ji dilê min nayê, ez çî bikim, ne di destê min de ye. Ev cehaleta ku min li vir dît têt dîke. (Şampanya vedixwe.) Niha çî fêda giriyê te heye? Hebekî bi ser xwe ve were, wê çaxê tu ê nexwazibî bigirî.

DUNYAŞA (Li neynika xwe a bêrîkan dinihêre û rûyê xwe podra dîke): Li Parîsê ji min re binivîsîne. Ez ewqasî bi te ve hatibûm girêdan, Yaşa, ez ewqasî hatibûm girêdan ku! Ez mirovekî pir hesas im, Yaşa.

YAŞA: Yek têt. (Bi dengê nizim ji xwe re stranekê dinuhurîre û mîna ku bi bagajan ve mijûl e, dîke.)

(Ranevskaya, Gayev û Şarlotta dikevin sehnê.)

GAYEV: Em bi rê bikevin? Êdî wext e. (Li Yaşa dinihêre.)

Bîna masî ji kê têt?

RANEVSKAYA: Divê em piştî deh deqîqeyên din cihê xwe bigirin. (Çavên xwe li odê digêrin.) Bi xatirê te mala me ya xweşik, di xweşiyê de bimîne, kalikê me! Gava zivistan derbas be û dîsan bihar were, êdî tu ê ne li vir bî; Wê te hilweşînin. Ax, ger zimanê van dîwaran hebûya û bipeyiviyana! (Bi coş Anyayê maçîdîke.) Gencîneya min, tu dibiriqî, çavên te mîna du elmasan şewq didin. Ma tu dilşa

yî? Ma tu gelekî dilşa yî?

ANYA: Erê, Em dest bi jiyaneke nû dikin, yadê.

GAYEV (Bi şahî): Rast e, êdî her tişt kete rê. Berî ku bexçê

82

vîşne were firotin, em hemû di meraqê de bûn, em perîşan bûn; lê kar, pişti bi celebê careke din bi paş de venegere, kete rê, em hemû rehet bûn, heta kêfa me hate cih. Ez jî êdî bûme bankevan, fîransman...

Min yek li ya sor xist! Lê herçî tu yî, Luba, tu çî dibêjî bibêje, tu her tim baştir dixuyî, di vê de qet şik tune.

RANEVSKAYA: Erê, rast e, ez niha rehet im. (Jê re dibe alîkar ku şevqe û mantoyê xwe li xwe bike.) Êdî xewa min jî baş bûye. Firaxên min derxe, Yaşa.

Divê em têkevin rê. (Ji Anyayê re.) Em ê dîsan hevdu bibînin, şîrîna min... Ez diçime Parîsê; ez ê bi pereyên ku pîrka te ji bo kirîna milk ji Yaroslavlê şandine bijîm. Xwedê ji pîrka te razî be! Lê ez ditirsim ev pere ji bo demeke dirêj têr neke.

ANYA: Hûn ê tavi lê vegehin, ne wilo, yadê? Hema ez vê îmtihana lîseyê bidim, ez ê milên xwe lê wergerînim

û alîkariya we bikim. Em ê bi hev re têra xwe pirtûkan bixwînin, ne wilo, yadê? (Destê diya xwe

maçîdike.) Em ê şevên dirêj yên payizan bi hev re pirtûkan bixwînin û wê li pêşiya me dinyayên nû û bêhawe xweş vebin. (Bi xeyal.) Zû vegere, yadê!

RANEVSKAYA: Ez ê vegehim, meleka min. (Anyayê hemêz dike.)

(Lopahîn dikeve sehnê. Şarlotta di ber xwe de stranekê dibêje.)

GAYEV: Bijî (Şarlotta distirê.)

ŞARLOTTA: (Pakêteke ku dişibe pitikekê dixê ber hemeza
83

vîşne were firotin, em hemû di meraqê de bûn, em perîşan bûn; lê kar, pişti bi celebê careke din bi paş de venegere, kete rê, em hemû rehet bûn, heta kêfa me hate cih. Ez jî êdî bûme bankevan, fîransman...
Min yek li ya sor xist! Lê herçî tu yî, Luba,
tu çî dibêjî bibêje, tu her tim baştir dixuyî, di vê de qet şik tune.

RANEVSKAYA: Erê, rast e, ez niha rehetim. (Jê re dibe alîkar ku şevqe û mantoyê xwe li xwe bike.) Êdî xewa min jî baş bûye. Firaxên min derxe, Yaşa.
Divê em têkevin rê. (Ji Anyayê re.) Em ê dîsan hevdu bibînin, şîrîna min... Ez diçime Parîsê; ez ê bi pereyên ku pîrka te ji bo kirîna milk ji Yaroslavlê şandine bijîm. Xwedê ji pîrka te razî be! Lê ez ditirsim ev pere ji bo demeke dirêj têr neke.

ANYA: Hûn ê tavilê vegezin, ne wilo, yadê? Hema ez vê îmtihana lîseyê bidim, ez ê milên xwe lê wergerînim û alîkariya we bikim. Em ê bi hev re têra xwe pirtûkan bixwînin, ne wilo, yadê? (Destê diya xwe maçîdike.) Em ê şevên dirêj yên payizan bi hev re pirtûkan bixwînin û wê li pêşiya me dinyayên nû û bêhawe xweş vebin. (Bi xeyal.) Zû vegere, yadê!

RANEVSKAYA: Ez ê vegezim, meleka min. (Anyayê hemêz

dike.)

(Lopahîn dikeve sehnê. Şarlotta di ber xwe de stranekê dibêje.)

GAYEV: Bijî (Şarlotta distirê.)

ŞARLOTTA: (Pakêteke ku dişibe pitikekê dixê ber hemeza
83

xwe): Lorî, pitika min, lorî... (Pitik bersiv dide: "wua-wua.") Lê tu dilê diya xwe dihêlî. (Pakête davêje erdê.) Ji bîr neke, ji kerema xwe re ji min re jî cihekî nû peyda bikin. Ez nikanim wilo li navê bimînim.

LOPAHÎN: Em ê bibînîn, bibînîn, Şarlotta, tu mereq neke.

GAYEV: Her kes me terk dikin. Varya jî diçe. Ji nişkê ve, kes hew li rûyê me dinihêre. (Di ber xwe de distirê.)

Deloo, tu jî!

(Pîşçîk dikeve sehnê.)

LOPAHÎN: Berhema xwezayê!

PÎŞÇÎK (Bi ufû kufj: Of!... A wilo ez bêhna xwe berdim!

Ez mirim, hal di min de nema!... Dostên min yê esilzade, hinek av bidin min.

GAYEV: Hûn dîsan peran dixwazin, ne wilo? Ez naxwazim, bila kêmbê; hela ez serê xwe ji belê xelas bikim.

(Derdikeve.)

PÎŞÇÎK: Ji cara dawî ku ez hatim vir û bi vir ve, sed sal derbas bûn, spehîra xaniman. (Ji Lopahîn re.) Ma

tu li vir bû? Ez bi dîtina te gelekî kêfxweş bûm, tu mirovekî jîr û zana yî. Fermo... bigire (Pera dide

Lopahîn.) Çarsed ruble. Heşt sed û çil ruble deynê

te li min dimîne.

LOPAHÎN (Ecêbmayî maye, milên xwe dihejîne): Yaho, ev mîna xewnekê ye! Te ev pere ji ku anîn?

PÎŞÇÎK: Deqîqeyekê raweste... oh! Ez şewitîm Wele... Ev bûyereke fewqelade ye, mîrza. Komêk îngilîz hatin, di nava erdê min de celebekî kilsa spî dîtî. (Ji 84

xwe): Lorî, pitika min, lorî... (Pitik bersiv dide: "wua-wua.") Lê tu dilê diya xwe dihêlî. (Pakêtê davêje erdê.) Ji bîr neke, ji kerema xwe re ji min re jî cihekî nû peyda bikin. Ez nikanim wilo li navê bimînim.

LOPAHÎN: Em ê bibînin, bibînin, Şarlotta, tu mereq neke.

GAYEV: Her kes me terk dîkin. Varya jî diçe. Ji nişkê ve, kes hew li rûyê me dinihêre. (Di ber xwe de distirê.) Deloo, tu jî!

(Pîşçîk dikeve sehnê.)

LOPAHÎN: Berhema xwezayê!

PÎŞÇÎK (Bi ufû kufj: Of!... A wilo ez bêhna xwe berdim! Ez mirim, hal di min de nema!... Dostên min yê esilzade, hinek av bidin min.

GAYEV: Hûn dîsan peran dixwazin, ne wilo? Ez naxwazim, bila kêmbê; hela ez serê xwe ji belê xelas bikim. (Derdikeve.)

PÎŞÇÎK: Ji cara dawî ku ez hatim vir û bi vir ve, sed sal derbas bûn, spehîtira xaniman. (Ji Lopahîn re.) Ma tu li vir bû? Ez bi dîtina te gelekî kêfxweş bûm, tu mirovekî jîr û zana yî. Fermo... bigire (Pera dide

Lopahîn.) Çarsed ruble. Heşt sed û çil ruble deynê
te li min dimîne.

LOPAHÎN (Ecêbmayî maye, milên xwe dihejîne): Yaho, ev
mîna xewnekê ye! Te ev pere ji ku anîn?

PÎŞÇÎK: Deqîqeyekê raweste... oh! Ez şewitîm Wele... Ev
bûyereke fewqelade ye, mîrza. Komêk îngilîz hatin,
di nava erdê min de celebekî kilsa spî dîtî. (Ji

84

Ranevskayayê re.) Ev e, ji te re jî çarsed ruble, hey
xanima spehî û bedew. (Pera didê.) Dawiya maye
jî paşê. (Ava xwe vedixwe.) Berî niha bi kêliyê
di trêne de xortekî behs dikir... fîlosofê mezî
gotiye, ya qenc ew e her kes xwe ji ser xaniyê xwe
biavêje erdê. Xwe biavêjin, gotiye, wê çaxê hûn ê
xatirê jiyane bizanibin. (Bi awayekî ecêbmayî.) Bifikire!
Eh, hinek ava din!

LOPAHÎN: Ev îngilîz kî ne?

PÎŞÇÎK: Min ew erdê xwe yê bi kils ji bo bîst û çar salan bi
deman daye wan. Li min bibuhure, wexta min tune
ye... divê ez herim... Ez ê herim Snojkov...

herim Kardamanov... Ez deyndarê her kesî me...

(Vedixwe.) Roja pêncşemê ez ê dîsan werim.... Bi
xatirê we û heya wê çaxê di xweşiyê de bimînin...

RANEVSKAYA: Em jî niha diçûn bajêr, ez ê sibehê herim
derveyê welêt.

PÎŞÇÎK: Çi! (Di nava dehşetê de.) Hûn bar dikin bajêr? Ew,
ez fêhm dikim - alav, sindoq... Ji destê me çi tê!

Zeka van îngilîzan fewqelade bi quwet e. Baş e,

maşalê hûn dilşa bibin. Xwedê alîkarê we be...
baş e. Li vê dinyayê dawiya her tiştî heye. (Destê
Ranevskayayê maçî dike.) Ger nûçeya dawîhatina
min jî ji we re were, vî. . . vî bergîrê pîr jî bi bîr bî-
nin û bêjin ku: "Demekê, yekî bi navê SîmyonovPîşçîk
jiyaye, Xwedê gunehên wî efû bike." Hewa
jî çiqas xweş e... Erê. (Bi rewşeke pir bi testr derdikeve,
lê tavilê, bi şûn de vedigere û li devê derî
dipeyive.) Silavên Daneşkayê li we hene. (Derdikeve.)

85

Ranevskayayê re.) Ev e, ji te re jî çarsed ruble, hey
xanima spehî û bedew. (Pera didê.) Dawiya maye
jî paşê. (Ava xwe vedixwe.) Berî niha bi kêliyêkê
di trêne de xortekî behs dikir... fîlosofêkî mezin
gotiye, ya qenc ew e her kes xwe ji ser xaniyê xwe
biavêje erdê. Xwe biavêjin, gotiye, wê çaxê hûn ê
xatirê jiyane bizanibin. (Bi awayekî ecêbmayî.) Bifikire!
Eh, hinek ava din!

LOPAHÎN: Ev îngîlîz kî ne?

PÎŞÇÎK: Min ew erdê xwe yê bi kils ji bo bîst û çar salan bi
deman daye wan. Li min bibuhure, wexta min tune
ye... divê ez herim... Ez ê herim Snojkov...

herim Kardamanov... Ez deyndarê her kesî me...

(Vedixwe.) Roja pêncşemê ez ê dîsan werim.... Bi
xatirê we û heya wê çaxê di xweşiyê de bimînin...

RANEVSKAYA: Em jî niha diçûn bajêr, ez ê sibehê herim
derveyî welêt.

PÎŞÇÎK: Çi! (Di nava dehşetê de.) Hûn bar dikin bajêr? Ew,

ez fêhm dikim - alav, sindoq... Ji destê me çî têt!
Zeka van îngilîzan fewqelade bi quwet e. Baş e,
maşalê hûn dilşa bibin. Xwedê alîkarê we be...
baş e. Li vê dinyayê dawîya her tiştî heye. (Destê
Ranevskayayê maçî dike.) Ger nûçeya dawîhatina
min jî ji we re were, vî. . . vî bergîrê pîr jî bi bîr bî-
nin û bêjin ku: "Demekê, yekî bi navê SîmyonovPîşçîk
jîyaye, Xwedê gunehên wî efû bike." Hewa
jî çiqas xweş e... Erê. (Bi rewşeke pir bi testr derdikeve,
lê tavilê, bi şûn de vedigere û li devê derî
dipeyive.) Silavên Daneşkayê li we hene. (Derdikeve.)
85

RANEVSKAYA: Em êdî dikarin herin. Ez tenê li du tiştan
difikirim. Yek jê Fîrs e, kalê reben. (Li saeta xwe
mêze dike.) Em dikanin pênc deqîqeyên din jî bimînin.
ANYA: Fîrs çûye nexweşxanê, yadê. Vê sibehê Yaşa ew
şand.

RANEVSKAYA: Ya din jî ku ez mereq dikim, Varya ye. Ew
fêr bûye ku sibehan zû rabe û bixebite, niha ger
ew karekî ku bike nebîne, wê mîna masiyê ku ji
nava avê derketibe, lê were. Van demên dawî ew
jar bûye, çilmisî ye, pir jî digirî, rebenê. (Kurtebê-
dengiyek.) Tu baş pê dizanî, Yermolay, min ji berê
de her hêvî kiriye ku hûn bi hev re bizewicin, yek
jî, ev yeka han eşkere dihate dîtin. (Di guhê Anyayê
de bi pistînî tişteki dibêje, piştî wê Anya ji Şarlottayê
re bi serî îşaret dike û herdu bi hev re derdikevin.)
Varya ji te hez dike, tu jî ji wê hez dikî.

Ya rastî ez nizanim bê hûn çima herdu ji hev direvin.
Ez qet fêhm nakim!

LOPAHÎN: Ya rastî ez jî nizanim. Bi rastî jî pir ecêb e. Ez
hazir im... Ger ne dereng be, em vî karî çareser
bikin; niha, tavilê em vî karî dawî bînin, bila here;
Bi min wilo ê ku, gava tu ne li ba me bî, ez ê qet
nikanibim bi xwe pêşniyaza zewacê jê re bibim.

RANEVSKAYA: Harîka! Hem ji xwe, pir pir deqîqeyeke me
bigire. Ez ê a niha bang wî bikim.

LOPAHÎN: Ev e, şampanya jî li vir hazir e. (Li qedehan dinihêre.)
Vala bûye! Yekî vexwariye. (Yaşa dikuxe.)

Ez ji vê re çavbirçîtî dibêjim, rasterast çavbirçîtî!

RANEVSKAYA (JBi heyecan): Harîka! Heydê em herin...

86

RANEVSKAYA: Em êdî dikarin herin. Ez tenê li du tiştan
difikirim. Yek jê Fîrs e, kalê reben. (Li saeta xwe
mêze dike.) Em dikanin pênc deqîqeyên din jî bimînin.

ANYA: Fîrs çûye nexweşxanê, yadê. Vê sibehê Yaşa ew
şand.

RANEVSKAYA: Ya din jî ku ez mereq dikim, Varya ye. Ew
fêr bûye ku sibehan zû rabe û bixebite, niha ger
ew karekî ku bike nebîne, wê mîna masiyê ku ji
nava avê derketibe, lê were. Van demên dawî ew
jar bûye, çilmisî ye, pir jî digirî, rebenê. (Kurtebê-
dengiyek.) Tu baş pê dizanî, Yermolay, min ji berê
de her hêvî kiriye ku hûn bi hev re bizewicin, yek
jî, ev yeka han eşkere dihate dîtin. (Di guhê Anyayê
de bi pistînî tişteki dibêje, piştî wê Anya ji Şarlottayê

re bi serî îşaret dike û herdu bi hev re derdikevin.)

Varya ji te hez dike, tu jî ji wê hez dikî.

Ya rastî ez nizanîm bê hûn çima herdu ji hev direvin.

Ez qet fêhm nakim!

LOPAHÎN: Ya rastî ez jî nizanîm. Bi rastî jî pir ecêb e. Ez

hazir im... Ger ne dereng be, em vî karî çareser

bikin; niha, tavilê em vî karî dawî bînin, bila here;

Bi min wilo ê ku, gava tu ne li ba me bî, ez ê qet

nikanibim bi xwe pêşniyaza zewacê jê re bibim.

RANEVSKAYA: Harîka! Hem ji xwe, pir pir deqîqeyeke me

bigire. Ez ê a niha bang wî bikim.

LOPAHÎN: Ev e, şampanya jî li vir hazir e. (Li qedehan dinihêre.)

Vala bûye! Yekî vexwariye. (Yaşa dikuxe.)

Ez ji vê re çavbirçîtî dibêjim, rasterast çavbirçîtî!

RANEVSKAYA (JBi heyecan): Harîka! Heydê em herin...

86

Alez, Yaşa. Ez ê bang Varya bikim (Ji derî de.)

Varya, dev ji her tiştî berde û were vir. Zû were!

(Ew û Yaşa bi hev re derdikevin.)

LOPAHÎN (Li saeta xwe dinihêre): ihm. (Kurtebêdengiyek.)

(Ji pişt derî dengê kenên bi pîvan û dengê

kurtûpistê tê bihîstin. Paşê Varya dikeve sehnê.)

VARYA (Bi rêk û pêk bagajan di çav re derbas dike): Pir

ecêb e, ez qet li cihekî jî nabînim.

LOPAHÎN: Tu li çi digerî?

VARYA: Min bi xwe pêça bû, lê niha nayê bîra min. (Kurtebêdengiyek.)

LOPAHÎN: Niha tu ê herî ku, Varya Xan?

VARYA: Ez? Ez ê herim Ragulînan. Ez ê li cem wan bixebitim,

yanî wek ekonom.

LOPAHÎN: Ma ew ne li Yasnevoyê ye? Heştê kîlometre dûrî vir e. (Kurtebêdengiyek.) Wê çaxê tê wê manê ku li vê malê jîyan nemaye.

VARYA (Bagajan di çav re derbas dike.) Gelo wê ketibe ku? Dibe jî min xistibe hundurê sindoqê. Erê, li vir jîyan mir, careke din jî bi paş de venagere.

LOPAHÎN: Ez jî niha diçim Harkovê - bi eynî trêne. Komê karê divê ez bikim heye. Ji bo ku Yepîhodov li vir miqate be ez wî dihêlim. Wê li ba min be.

VARYA: Bi rastî?

LOPAHÎN: Par vî çaxî berf bariyabû, wê bê bîra te; lê niha hewa çiqas xweş e, roj derketiye. Lê dîsan jî sar e. Di binê sifrê re sê derece ye.

87

Alez, Yaşa. Ez ê bang Varya bikim (Ji derî de.) Varya, dev ji her tiştî berde û were vir. Zû were! (Ew û Yaşa bi hev re derdikevin.)

LOPAHÎN (Li saeta xwe dinihêre): ihim. (Kurtebêdengiyek.) (Ji pişt derî dengê kenên bi pîvan û dengê kurtûpistê tê bihîstin. Paşê Varya dikeve sehnê.)

VARYA (Bi rêk û pêk bagajan di çav re derbas dike): Pir ecêb e, ez qet li cihekî jî nabînim.

LOPAHÎN: Tu li çi digerî?

VARYA: Min bi xwe pêça bû, lê niha nayê bîra min. (Kurtebêdengiyek.)

LOPAHÎN: Niha tu ê herî ku, Varya Xan?

VARYA: Ez? Ez ê herim Ragulînan. Ez ê li cem wan bixebitim, yanî wek ekonom.

LOPAHÎN: Ma ew ne li Yasnevoyê ye? Heştê kîlometre dûrî vir e. (Kurtebêdengiyek.) Wê çaxê tê wê manê ku li vê malê jîyan nemaye.

VARYA (Bagajan di çav re derbas dike.) Gelo wê ketibe ku? Dibe jî min xistibe hundurê sindoqê. Erê, li vir jîyan mir, careke din jî bi paş de venagere.

LOPAHÎN: Ez jî niha diçim Harkovê - bi eynî trêne. Komek karê divê ez bikim heye. Ji bo ku Yepîhodov li vir miqate be ez wî dihêlim. Wê li ba min be.

VARYA: Bi rastî?

LOPAHÎN: Par vî çaxî berf bariyabû, wê bê bîra te; lê niha hewa çiqas xweş e, roj derketiye. Lê dîsan jî sar e. Di binê sifrê re sê derece ye.

87

VARYA: Rast e? Min lê nenihêrî bû. (Bêdengiyek.) Ji xwe termometreya me jî xera bûye. (Kurtebêdengiyek.)

DENGEK (Ji derê hewşê): Mîrza Lopahîn!

LOPAHÎN (Mîna li bendî bû ku wê bang wî bikin): Ez têm! (Zû derdikeve.)

(Varya li erdê rûdine, serê xwe dispêre buxçikek kincan, hêdîka bi îskînî digirî. Derî vedibe, Ranevskaya bi îhtiyadî dikeve hundur.)

RANEVSKAYA: Êê? (Kurtebêdengiyek.) Divê em herin.

VARYA (Çavên xwe ziwa kirine, êdî nagirî): Erê, dem hatiye, yadê. Ger ez ji trêne nemînim, ez ê jî îro herim Ragulînan.

RANEVSKAYA (Bangî derve dike): Anya, heydê kincên xwe li xwe ke.

(Anya û paşê jî Gayev û Şarlotta dikevin sehnê.
Paltoyekî qalind î bi kum li Gayev e. Xulam û
erebevan dikevin hundur. Yepîhodov li dora bagajan
zîz dibe.)

RANEVSKAYA: Êdî em dikarin bi rê bikevin.

ANYA (Bi kêf): Em bi rê dikevin!

GAYEV: Dostên min, dostên min yên ezîz û bi qîmet! Niha,
gava em dikin ji vê malê ebedî bi dûr bikevim, ez ê
çawan bêdeng bimînim? Ez bi xwe nikarim, ku ez
hemû heyacana xwe neynime ziman.

ANYA (Bi bergertn): Xalo!

VARYA: Xalo, ji kerema xwe re bihêle!

88

VARYA: Rast e? Min lê nenihêrî bû. (Bêdengiyek.) Ji xwe
termometreya me jî xera bûye. (Kurtebêdengiyek.)

DENGEK (Ji derê hewşê): Mîrza Lopahîn!

LOPAHÎN (Mîna li bendî bû ku wê bang wî bikin): Ez têm!
(Zû derdikeve.)

(Varya li erdê rûdine, serê xwe dispêre buxçikek
kincan, hêdîka bi îskînî digirî. Derî vedibe, Ranevskaya
bi ihtiyadî dikeve hundur.)

RANEVSKAYA: Êê? (Kurtebêdengiyek.) Divê em herin.

VARYA (Çavên xwe ziwa kirine, êdî nagirî): Erê, dem hatiye,
yadê. Ger ez ji trêne nemînim, ez ê jî îro herim
Ragulînan.

RANEVSKAYA (Bangî derve dike): Anya, heydê kincên
xwe li xwe ke.

(Anya û paşê jî Gayev û Şarlotta dikevin sehnê.

Paltoyekî qalind î bi kum li Gayev e. Xulam û erebevan dikevin hundur. Yepîhodov li dora bagajan zîz dibe.)

RANEVSKAYA: Êdî em dikarin bi rê bikevin.

ANYA (Bi kêf): Em bi rê dikevin!

GAYEV: Dostên min, dostên min yên ezîz û bi qîmet! Niha, gava em dikin ji vê malê ebedî bi dûr bikevim, ez ê çawan bêdeng bimînim? Ez bi xwe nikarim, ku ez hemû heyacana xwe neynime ziman.

ANYA (Bi bergertn): Xalo!

VARYA: Xalo, ji kerema xwe re bihêle!

88

GAYEV (Bi keder): Ez ê yekê li ya sor bixim, ez ê bêdeng bimînim... (Pêşî Trofîmov, paşê jî Lopahîn dikevin hundur.)

TROFIMOV: Heydê werin, dem hatiye.

LOPAHÎN: Yepîhodov, paltoyê min.

RANEVSKAYA: Ez ê deqîqeyeke din jî li vir bimînim. Tu dibêjî qey min berê dîwarên vî xanî, zikê vî xanî nedîtiye, ez niha dixwazim bi hezkirineke mezin, mîna ku ez ê daqurtînim, temaşe bikim.

GAYEV: Niha tê bîra min, gava ez şeş salî bûm, ez rojên yekşema li ber vê pencereyê rûdiniştim û min çûyina bavê xwe ya dêrê temaşe dikir.

RANEVSKAYA: Tiştêk li dû me nema, ne wilo?

LOPAHÎN: Divê tişt nemabe. (Gava paltoyê xwe li xwe dike, ji Yepîhodov re.) Binêr bê her tiştêkê temam e?

YEPÎHODOV: (Bi dengê ketî): Tu dikarî baweriya xwe bi min bînî, mîrza Lopahîn.

LOPAHÎN: Çi bi dengê te hatiye?

YEPÎHODOV: Gava min av vexwar tişteket kete qirika min.

YAŞA (Bi tewrekê kêmdîtin): Ev cahîltî ye!

RANEVSKAYA: Em diçin, divê evdekê Xwedê jî li vir nemî- ne. LOPAHÎN: Heta biharê, erê.

(Varya ji buxçîkekê şemsiyekê wilo bi lez dikişîne, mirov dibêje qey wê pê li Lopahîn bixe. Lopahtn mîna ku tirsiyabe hereket dike.)

89

GAYEV (Bi keder): Ez ê yekê li ya sor bixim, ez ê bêdeng bimînim...

(Pêşî Trofîmov, paşê jî Lopahîn dikevin hundur.)

TROFIMOV: Heydê werin, dem hatiye.

LOPAHÎN: Yepîhodov, paltoyê min.

RANEVSKAYA: Ez ê deqîqeyeke din jî li vir bimînim. Tu dibêjî qey min berê dîwarên vî xanî, zikê vî xanî nedîtiye, ez niha dixwazim bi hezkirineke mezin, mîna ku ez ê daqurtînim, temaşe bikim.

GAYEV: Niha tê bîra min, gava ez şeş salî bûm, ez rojên yekşema li ber vê pencereyê rûdiniştim û min çûyina bavê xwe ya dêrê temaşe dikir.

RANEVSKAYA: Tişteket li dû me nema, ne wilo?

LOPAHÎN: Divê tişt nemabe. (Gava paltoyê xwe li xwe dike, ji Yepîhodov re.) Binêr bê her tiştê temam e?

YEPÎHODOV: (Bi dengê ketî): Tu dikarî bawerîya xwe bi min bînî, mîrza Lopahîn.

LOPAHÎN: Çi bi dengê te hatiye?

YEPÎHODOV: Gava min av vexwar tişteket kete qirika min.

YAŞA (Bi tewrekê kêmdîtin): Ev cahîltî ye!

RANEVSKAYA: Em diçin, divê evdekî Xwedê jî li vir nemî- ne. LOPAHÎN: Heta biharê, erê.

(Varya ji buxçikekê şemsiyekê wilo bi lez dikişîne, mirov dibêje qey wê pê li Lopahîn bixe. Lopahtn mîna ku tirsiyabe hereket dike.)

89

VARYA: Hê ne çî! Hîç fikreke min ya weha tunebû.

TROFÎMOV: Werin, em cihên xwe bigirin. Wext tamam e. Wextî trê n were.

VARYA: Galoşên te va ne, Petya, li ba qutiyê. (Bi çavên bi hêsir.) Çi jî pîs in, ya Rebî!

TROFÎMOV (Gava galoşên xwe dixê pê): Heydê, werin, dostino.

GAYEV (Pir hîsî bûye, ji bo ku negirî bi zorê xwe digire.)

Trên-stasyon. Tu ê ya sor bajo kortalê, yê spî jî bajo quncikê!

RANEVSKAYA: Em herin, heydê!

LOPAHÎN: Her kes li vir in? Kes nema, ne wilo? (Deriyê li milê çepê kilît dike.) Me hemû tişt xistine vir. Balo ez kilît bikim. Em herin!

ANYA: Bi xatirê te mala me, bi xatirê te kevnejyana me!

TROFÎMOV: Tu bi xêr hat, jiyana nû! (Bi Anyayê re derdikevin.)

(Varya çavên xwe li dora xwe digerrîne, hêdî hêdî derdikeve. Yaşa û Sarlotta û kûçikê xwe jî derdikevin.)

LOPAHÎN: Wê çaxê heta biharê. Heydê, her kes têkevin rê.

Bi hêviya hevdudîtî nê! (Derdikeve.)

(Ranevskaya û Gayev bi tenê dimînin. Ew di rewşeke wilo de ne, ku mirov dibêje qey ew ji mêj ve

li bendt vê kêliyê bûn; xwe li hev dipêçin, bi tirs
ku dengê wan neçe kesî, hêdî hêdî, ji dil digirîn.)

90

VARYA: Hê ne çî! Hîç fikreke min ya weha tunebû.

TROFÎMOV: Werin, em cihên xwe bigirin. Wextê temam e.
Wextî trê were.

VARYA: Galoşên te va ne, Petya, li ba qutiyê. (Bi çavên bi
hêsir.) Çi jî pîs in, ya Rebî!

TROFÎMOV (Gava galoşên xwe dixê pê): Heydê, werin,
dostino.

GAYEV (Pir hîsî bûye, ji bo ku negirî bi zorê xwe digire.)
Trên-stasyon. Tu ê ya sor bajo kortalê, yê spî jî
bajo quncikê!

RANEVSKAYA: Em herin, heydê!

LOPAHÎN: Her kes li vir in? Kes nema, ne wilo? (Deriyê li
milê çepê kilît dike.) Me hemû tişt xistine vir. Balo
ez kilît bikim. Em herin!

ANYA: Bi xatirê te mala me, bi xatirê te kevnejyana me!

TROFÎMOV: Tu bi xê hat, jiyana nû! (Bi Anyayê re derdikevin.)
(Varya çavên xwe li dora xwe digerîne, hêdî hêdî
derdikeve. Yaşa û Sarlotta û kûçikê xwe jî derdikevin.)

LOPAHÎN: Wê çaxê heta biharê. Heydê, her kes têkevin rê.
Bi hêviya hevdu dîtînin! (Derdikeve.)

(Ranevskaya û Gayev bi tenê dimînin. Ew di rew-
şeke wilo de ne, ku mirov dibêje qey ew ji mêj ve
li bendt vê kêliyê bûn; xwe li hev dipêçin, bi tirs
ku dengê wan neçe kesî, hêdî hêdî, ji dil digirîn.)

90

GAYEV (Bi kedereke kûr): Birayê min! Keko!

RANEVSKAYA: Ax, bexçeyê min yê xweşik! Bexçeyê min yê delal! Ji yana min, ciwaniya min, dilşahiya min, bi xatirê te! Bi xatirê te!

ANYA (Ji derveyîsehnê bi şahî bang dike): Yadêê!

TROFÎMOV (Bi kêfû heyecan): Hêê!

RANEVSKAYA: Ez cara dawî li dîwar û pencereyan binihêrim. Diya min ya delal di van odeyan de digeriya.

GAYEV: Xwakê, xwaka min...

ANYA (Ji derveyîsehnê): Yadêê!

TROFÎMOV (Ji derveyîsehnê): Hêê!

RANEVSKAYA: Ez têm! (Derdikevin.)

(Sehne vala dimîne. Dengê kilîtkirina deriyan û dengê birêketina erebeyan tete bihîstin. Der û dor bêdeng dibe. Di nava bêdengiyê de dengê xizok û dagirtî yê bivir tete bihîstin. Dengê linginan tete. Di deriyê milê çepê de Fîrs xuya dike. Mîna her car, qapûtkê wî yê serşokê û êlegê wî yê spî lê ye û terlikên wî di lingên wîdene. Nexweş e.)

FÎRS (Diçe ku derîveke.) Derî kilîtkirine. Hemû çûne. (Li ser dîwanekê rûdine.) Wan ez ji bîr kirime. Bila be! Ez ji xwe re hinekî li vir rûnê. Ji sedî sed beg ji berdêla paltoyê xwe yê bi kurk, paltoyê qumaş li xwe kiriye. (Bi derd bêhna xwe berdide.) Wî wext nehişt ku ez kincên wî lê bikim. Xortanî ye! Cahiltî! (Tiştin ku nayên fêhm kirin di ber xwe de dibêje.) Jiyan çawan hat û çû, mîna ku ez qet nejiyabim. (Xwe li erdê dirêj dike.) Qet nebe ez hebe-

GAYEV (Bi kedereke kûr): Birayê min! Keko!

RANEVSKAYA: Ax, bexçeyê min yê xweşik! Bexçeyê min yê delal! Jiyana min, ciwaniya min, dilşahiya min, bi xatirê te! Bi xatirê te!

ANYA (Ji derveyîsehnê bi şahî bang dike): Yadêê!

TROFÎMOV (Bi kêfû heyecan): Hêê!

RANEVSKAYA: Ez cara dawî li dîwar û pencereyan binihêrim. Diya min ya delal di van odeyan de digeriya.

GAYEV: Xwakê, xwaka min...

ANYA (Ji derveyîsehnê): Yadêê!

TROFÎMOV (Ji derveyîsehnê): Hêê!

RANEVSKAYA: Ez têm! (Derdikevin.)

(Sehne vala dimîne. Dengê kilîtkirina deriyan û dengê birêketina erebeyan tête bihîstin. Der û dor bêdeng dibe. Di nava bêdengiyê de dengê xizok û dagirtî yê bivir tê bihîstin. Dengê linginan tê. Di deriyê milê çepê de Fîrs xuya dike. Mîna her car, çapûtkê wî yê serşokê û êlegê wî yê spî lê ye û terlikên wî di lingên wîdene. Nexweş e.)

FÎRS (Diçe ku derîveke.) Derî kilît kirine. Hemû çûne. (Li ser dîwanekê rûdine.) Wan ez ji bîr kirime. Bila be! Ez ji xwe re hinekî li vir rûnêm. Ji sedî sed beg ji berdêla paltoyê xwe yê bi kurk, paltoyê qumaş li xwe kiriye. (Bi derd bêhna xwe berdide.) Wî wext nehişt ku ez kincên wî lê bikim. Xortanî ye! Cahiltî! (Tiştin ku nayên fêhm kirin di ber xwe de dibêje.) Jiyana çawan hat û çû, mîna ku ez qet nejiyabim.

(Xwe li erdê dirêj dike.) Qet nebe ez hebe-
91

kî xwe li vir dirêj bikim. Hîç hêza te nemaye, tu
çûyî. Ax, ax tu... bêkêrê bêkêr! (Tevnalive.)
(Ji dûr ve, dengêkî mîna dengê têtên tembûrê ku ji
esmanan qetiyabe û hatibe têt bihîstin, b't hizin û
xemgînî kêr dibe, kêr dibe û winda dibe. Ji dengê
bivirê ku li nava bexçeyê vîşne daran dibirre pê
ve tu dengnayê.)

PERDE

92

kî xwe li vir dirêj bikim. Hîç hêza te nemaye, tu
çûyî. Ax, ax tu... bêkêrê bêkêr! (Tevnalive.)
(Ji dûr ve, dengêkî mîna dengê têtên tembûrê ku ji
esmanan qetiyabe û hatibe têt bihîstin, b't hizin û
xemgînî kêr dibe, kêr dibe û winda dibe. Ji dengê
bivirê ku li nava bexçeyê vîşne daran dibirre pê
ve tu dengnayê.)

PERDE

92

**

ÇIROKA NEWROZÊ

Şivan Perwer

ÇIROKA

NEWROZÊ

Wêne: Mamoste

Şivan Production

Rêza Zarokên Şivan (kaset-pirtûk) : 3

Çap:1, 1990

® Şivan Production

Navnîşan /Adress:

Şivan Production

-P.Box 26008

750 26 Uppsala/SWEDEN

-institut Kurde de Paris

106, RueLaFayette

750 10Paris/FRANCE

Tel: 1-48246464

-KOIVİKAR

Hansaring 28-30

5000 Köln - 1/DEUTSCHLAND

Tel: 221-123376

Çap: Çapxana APEC

ISBN: 91-630-0295-7

Me ev çîrok ji warê mezinan anî warê biçûkan.

Digel kêmasîyan cara pêşîn e ku çîroka Newrozê bo zarokan digel kitêbê di kasetê de bi muzîk û effêkt têt amadekmn.

Em hêvîdar in zarokên me pê kêfxweş bin û bi dile wan be.

Her welia li vê derê em sipasî niviskaren

kurd IVI Baksi û M. Lewendî dikin ku di amadekirina vê kitêbê de alîkarîya me kirin.

Şivan Perwer

i[^]ebû tinebû, welatel[^] iiebû, navê wî Medya bû.

l\ledya welatekî bi dar û ber, bi gul û rilian bû, çemên

wî fireh, çiyayên wî bilind, welatekî azad bû. Roja wî

xweş, gelê wî rûgeş û serbilind bû.

6

Medya me pirr şîrîn e

Tev de mêrg û kanî ne

Ciyê dapîr û kalan

Her tim ji bo me evîn e.

Belê....Gelê vî welatî dapîr û bavpîrên me kurda
bûn.

Lê, dilxweşî û kêfxweşîya vî welatî pirr neajot. Ewrên
reş û tarî bi ezmanê vî welatî ket. Kêf û evîn bû girî
û şîn. Gul û rihan çilmisîn. Edî roja Medya ji ber çiyar
melûl melûl û bi dilşewat hildihat. Ma gelo çi
bûbû ?

-Haha ha haaaaa hhahaaaaa

Dehak im, DehakL.Dehakê qral

Ezê rakim şûr û mertal

Ger ez werim xezebê

Ticar nadim we mecal

Ez Dehak im, Dehak im,

Li we fermanê rakim

Bi esker û marên xwe

Mala we tev xirakim

8

Dehak mirovekî zallm, bêbext û xeddar bû. Bi darê
zorê xwe kiribû qral. Malê gel talan dikir, keda wan
dixwar. Zarokên wan dibir û ji xwe re dikir leşker û
xizmetkar. Gava dê û bav zarok nedana, Dehak dest
bi kuştinê dikir. Mala wan dişewitand

Dehak:

-Bînin, bînin! Ji min re zarokan bînin!...Bînin, zarokên kurdan bînin!...Bira zarokên kurdan nexwînin, nebin mirovên baş. Ez dewleta kurda naxwazim. Bira kurd azad nebin. Bira bindest bin...Haa haaaa...ha Ez im, ez, qral im ez, serdar im, serok im, mezin im ez Kî kane serê xwe li ber min rake?.. Haa.. haaaa.. haaa

Zarokek:

-Ez naxwazim bibim leşkerê Dehak. Dehak pîr pîs e dayê Nahêle em bilîzin, yarîya bikin, bixwînin. Nahêle em ji dê û bav û ji heval û hogirên xwe hez bikin. Nahêle em bi welatê xwe şa bibin. Dehak ya me dikuje, ya jî ji xwe re dibe.

Dayik:

-Netirse kurê min. Wê roja me jî bê. Hindik maye. Li hember vî zalimî wê mêrxasek derkeve

10

Belê Li vî welatî mêrxasek hebû, 11 hemberê zaliman. Mêrxasek ku bi rik û gîr û hêrsa salan hesin diheland. Lepên wî bûbûn wek gurza, zend û bendên wî bûbûn wek mertalan, dilê wî bûbû wek çiyayê Herekolê. Zana, jîr û mêrxas bû. Navê wî Kawa bû.

Ezmanê me bi reş e

Gelê me dilnexweş e

Ey Kawa heta kengê

Zilmê 11 welat bimeşe?

Liyane dil liyane

Sebr û seman nemane

Ey Kawayê Hesinkar
Zar û zêç me nemane!

12

Gava Dehak vedixwar dîn û har dibû. Jana zilmê li serî dixist. Herdu marên xwe dida kêleka xwe, bi leşkerên xwe dadiket nava gund û bajaran. çî diket ber talan dikir, xera dikir û wêran dikir. Dema çavên zarokan li Dehak diket, ditirsîyan, lîstikên xwe diterikandin, xwendina xwe berdidan, direviyan çolê. Hinekan jî xwe diavêtin himbêza dayik û bavên xwe. Lê, ji destê Dehakê devbixwîn nedifilitîn.

Ez Dehakê qral im

Bi leşker û bi mar im

Yên zarokan nedin min

Ez bi wan re neyar im

Ha haa haaa haaaa

Zarok marokên kurdan

Dibêjin kurên merdan

Serî 11 ber min ranekin

Agir dixim her deran

Leşkerno herin ser wan

Bistînin ji dê-bavê wan

Ji bo min û marên deq

Bînin hemû zarokan

Gava ku Dehak mar û leşkerên xwe berda ser zarokan,
dayikek kurd derket meydanê û qîriya:

14

Hey kurdên belengaz

Em mane bê ser û saz
Dehak zarokan dibe
Çawa em bibin xelas?
Tu Dehakê zilimkar
Tu bi leşker û bi mar
Emê rojkê bibînin
Tuyê bimînî bêçar
Ez dayikek Medya me
Tucar ez neqediyame
Tovên min hîn gelek in
Di axê de jîn dame
Kawayê Hesinkar rewş didît. Lê bi sebr û bînfirêhî û
bi rik difikirî. Wî dixwest ku zarokên Kurdan bi hêz bin,
yekîtiyekê çêkin ku bikanibin rojekê Dehak bixînin û
dawîya zilm û zordestîya wî bînin.
Dikana Kawa tijî gîsin, dahs, misas, tevir, bivir, kuling
û bêr bû. Lê Kawa di dikana xwe de şûr û mertal,
xençer û xiştik, tîr û kevan, gurz û çakûç jî çêdikir.

16

'V

Zarok:

Kawa tu kalê me yî
Ronîya çavê me yî
Dehak koka me rakir
Ma tu li hêviya çî yî?

18

Dayikek:

Ji bo çî şûr û mertal?

Ey kurê Zerdeştê kal
Dehak Medya şewitand
Bo çi didî wî mecal?

19

Kalekî kurd:

Ey kurê min î Kawa
Ez nizanim bi çi awa
Tu vê zulmê dibînî
Divê Medya bêt awa!

20

Dapîrek:

Min we bi şîrê xwe mijand
Bi hêstirên çavan hejand
Hun ji bo çi sekinîne
Dehak laşê me pijand.

21

Cotkarek:

Cotkarekî bi kîn im
Zikê erdê diqelşînim
Bi wî gîsnê te çêkir
Tovên jînê diçînim

22

Zarok bi hev re:

Em in zarokên Medya
Em in hebûna Kurda
Zilma Dehak hilînin
Daku em nebin wenda.

23

Kawa hêdî hêdî ji dikana xwe derket û berbi gel
meşîya. Gel ji der û dora, ji çar alî dihatin. Çiqas diçû
hejmara gel zêde dibû. Zarok, keç, xort, dayik, bav,
jin, mêr, kal, pîr....Yek bû deh, deh bû sed, sed bû hezar
û deh hezar.... Cotkar bi misasan, nêçîrvan bi
tîrkevan û rîman, xort bi şûr û mertalan, pîr û kal bi dar
û gopalan, zarok bi çetelan li dora Kawa kom bûn.
Kawa derket ser dîwarekî bilind. Çavên wî wek
çavên pilingan diçirisî. Bi koloz û şal û şapik bû. Rih û
simêlên wî wek û şêran bû. Kawa bi heybet, çakûçê
xwe da ser milê xwe, kulma xwe bilind kir, silav da gel
ûgot:

-Zarokno, birano, xwişkno, dayik û bavno!

Li mêrga me dilîzin

Gur û çeçel û rovî

Li qada me dibezin

Mar û Dehak bi hovî

Me dît Dehak çi fikir

Bi salan me sebirdikir

Bi xebat, bi dil û can

îro me xwe hazir kir

Kawa Kawayê we ye

Bê we Kawa tune ye

Werin em dest bidin hev

Pêşîya me ronahî ye

24

Gel:

Tu Kawayê hesinkar

Tu zana û tu rêbar
Em bi te serbilind in
Tu yî rêber û serdar
Medya welatê me ye
Yekîtî karê me ye
Vaye me xwe hazir kir
Edî Dehak tineye
Piştî van gotinan, kêfa gel xweş bû. Zarokan yarî kirin,
xwe avêtin himbêza Kawa û pê şa bûn. Kal û
pîran destên xwe di serê wî dan, keç û xortan wî maçî
kirin. Gel bi hev şêwirî. Bû piste pista zarokan..
-Edî Dehako nikane me bibe.

-Emê bi kêfa dilê xwe bilîzin, yarîya bikin, bixwînin.

-Bijî Kawa!

Dilê Kawa şa bû. Kawa bi mêrxas û gernasanan vegehiya
dikanê. Xortan pifînî bi korikê xistin, kûre sor bû,
agir geş bû. Du xortên wek Ristemê Zal hesin xistin
nava agir. Hesin sor bû, kelijî û taw girt. Rakirin danîn
ber Kawa. Kawa çakûç girt nava lepên xwe yê mezînan,
bi wan zend û bendên pehlewanî hesin da ber
derban. Di demek kurt de gurzekî bi teqil deranî û
danî ber xortan.

Kawa berê xwe da gel û bang kir:

-Hevalno, hogirno. Bi sala ye ku me ji bo vê rojê tîr
û kevan, şûr û mertal, rim û gurz, xençer û xiştik
çêkirin. Iro, roj roja xebatê ye. Welat bê xebat û bê lebat
rizgar nabe. Divê em yekdest û yekmil bin...

26

Gel bi hev re:

Welat welatê me ye

Azadî rêça me ye

De rabin êdî rabin

Kawa serokê me ye

Kawa bang kal û pîr û xort û zarokan kir. Şêwr û
mişêwrên xwe danîn.

Kawa:

-Gelê mino, dilê min liyane

Emê bi hev din pênsed suwar, çarsed xortên bi şûr
ij mortal, sêsed pehlewanên bi gurz û dused mêrxasên
bi tîr û kevane.

Emê bilezînin gelî camêran, îro roj roja me ye, bira
berê xwe bidin qesra Dehakê malwêrane.

Emê bipelçiqînin serê Dehak û marane, xelaskin
welatê Medya ji talanê, bistînin heyfa zarokên kurdane....

Berbi êvarê hemû mêrxas, pêhlewan û gernas
amade bûn. Giş 11 hêvîya dengê Kawa bûn.

28

Kawa got:

-Gelî egît û pêhlewanan!..

îro roj roja mêranîyê ye. Divê em vê zilm û zordarîyê
ji ser xwe rakin, welatê xwe ji nû ve avakin.

Baş bizanibin ku bê xebat kes xelas nabe.

Hevalno!...Hun dizanin Dehak îro jî avêt ser gund û
bajaran. Zar û zêçan bir, malan talan kir. Lê min
bihîstîye ku Dehak dixwaze îşev vê zilm û zordarî û
talana xwe pîrozke. Piştî her talanekê li qesra xwe

şahîyê çêdike. Ew û leşkerên xwe dixwin û vedixwin, serxweş û sermest dibin. Ev jî ji bo me keyseke mezin e ku em bi hêsanî êrişî ser qesrê bikin. De rabin em bi rê kevin, gelî egît û mêrxasan.

Di destpêka şevê de, xort bi şûr û mertal, pêlewan bi gurz û xençer, mêrxas bi tîr û kevan, berbi qesra Dehak meşîyan. Berî roj hilê xwe gihandin ber qesrê. Kawa hemû pêhlewan û mêrxas û gernasên xwe li hawirdorê qesrê bi cih kir. Paşê bang çend hevalên xwe kir û got:

-Gelî hevalan, divê ku yek ji me têkeve hundurê qesrê. Li rewşa hundur binêre û derîyê mezin. Kurekî Kawa hebû. Biçûk bû. Navê wî Jîr bû. Weke navê xwe zîrek û baqil bû. Ew jî li gel bavê xwe bû. Jîr xwe avêt pêş û got:

-Bavo, destûrê bidin, ezê biçim hundur. Ez biçûk im, kes bi min nahese.

Pîr û kal qîriyan:

-Kawa, Kawa ev hîn zarok e!..

-Ma qey em mirine!..

-Jîr, ev ne karê te ye!..

29

^^)) ^^fe)^

-Welle kurik mêrxas e!

-Erê welle!..

Kawa:

-Na, gelî hevalan, ev karekî dilsozî û dilxwazîyê ye.

Madem Jîr dixwaze bila here. Jîr jîr e.

-De tu zanî Kawa.

-De baş e..

-BijîJîr!..

-Riya te vekirî be Jîr!

-Bijî mêrxasê biçûk!..

Kêfa Jîr gelek hat.

Kawa ji Jîr re got:

-Mêzeke kurê min, hay ji xwe be. şaşîyek dikane bibe sebeba jîyana te. Nuha emê werîseke bi çengel bavêjin ser dîwarê qesrê. Tuyê pêde hilkişî herî jor. Paşî di kuleka qesrê re têkeve hundur. Baş temaşe bike, kî çi dike. Pişt re çengela derîyê qesrê veke. Baş e?

Jîr:

-Baş e bavo, de hun min hildin jorê.

Jîr hilkişîya jorê. Li ser dîwarê qesrê 11 der dora xwe nihêrî. Nobedaran şerab vedixwar, serxweş bûbûn, ji xwe re sitran digotin. Bi Jîr nehesiyan. Jîr xwe berda nava qesrê.

Dehak ligel mar û leşkerên xwe kûpê şerabê bi ser serê xwe de dikir. Mar rabûbûn lotika, leşkeran govend dikişand.

Di nav lemelem û xurexur û hirehir û fişefişa serxweşan de dengê Dehak bilind bû:

31

r.yff.ffv^^

-Bînin, birrrrrr ji min re zarokên kurdan

bînin.-.zirrrr, xurrrr, fişşşşş!

Jîr di ber xwe de:

-Erê erê, tu bike fişefiş û birreber, tuyê bibînê zalimê pîs! Mar jî nikanin te xelas bikin.

Jîr hat pişt derîyê qesrê, bi pêçkên xwe yên biçûk çengela mezin û qirase bilind kir. Pişt re çû ser qesrê, îşaret da bavê xwe.

Kawa got:

-Aferîn Jîr, hey tu her hebî!

-Bijî Jîr!

-Tu çavê min î!

-Kurê mêrxasa mêrxas in.

Kawa da pêşîya gel êrişî qesrê kirin. Kawa xwe seranser gîhand cihê Dehak û got:

Ey Dehakê zilimkar

Bi wan herdu marên har

Te zar û zêçan qir kir

Mala me kir tar û mar

Bi teqla çakûçê min

Hêz distîne dilê min

Edî qedya zilma te

Bila bijî gelê min

Dehak ji ciyê xwe veciniqî. Hew nihêrî ku Kawa bi çakûç li ser serê wî sekinîye. Marên Dehak 11 erdê ji tirsê dilerizîn.

33

Dehak:

-Min kir tu nekî. Ez gune me, ez pepûk im, ez reben im. Zarokên min sêwî nehêle.

Kawa:

-Sêwî ha! Zarokên te zarok in, gelo ma yên Kurdan ne zarok in ha? Marê pîsê deqdeqî, tu hê behsa zarokan dikî...Yên heval mar, tim û tim dibin neyar. Te zar û zêç bi me ve nehîşt. Zilimkarê xeddar. Em dest nadin zarokên te. Ewê jî bi zarokên me re bilîzin û şa bibin.

34

w^^

Kawa çakûçê xwe bilind kir.

-A ji te re, de bixwe. Ev ji bo zarokan, ev ji bo dayikan, ev ji bo pîr û kalan..!

-Ax, of, ez miriiiiim, kanê marên miiin, kanê leşkerên min.

Lê ne mar û ne jî leşker hatin hewara Dehak.

Jîr çû serê qesrê agirekî mezin vêxist. Bi agirê Jîr re 11 çar alîyê welatê Medya agirê kêf û şahî û azadîyê bilind bû.

35

Roj2rêAdarêbû.

Dem hat dewran guherî.

Navê Medya bû Kurdistan.

Agirê azadîyê her maye li serê çîyan...!

36

Roja me ya nûhilat

Vêxin agirê felat

Ji wî welatê Medya

Newroza me bi xêr hat

Newroz cejna Kurda ye
Dîroka wê ji Medya ye
Her sal emê pîroz kin
Serfiraziya Kurda ye
Medya bûye Kurdistan
Iro ketiye bin destan
Dehakên nû li me rabûn
Xelas bikin ji bin destan
Newroz cejna Kurda ye
Dîroka wê ji Medya ye
Her sal emê pîroz kin
Serhildana Kurda ye

37

**

ÇÎROKÊN HEZAR Û ŞEVEKÊ

Çîrokên

HEZAR Û ŞEVEKÊ

Roşan

Wergera ji swêdî: Serdar

NÛDEM

Wejanên NÛDEM 38

Çîrokên Heiar Û Şevêkê

Stockholm: 1998

©WesanênNÛDEM

Pergala bergê û rûpelan NODEM

Wêneya bergê: Ji muzexancya îslamê ya li Berlînê

Çapa bergê: Jakobsbergs Tryckeri

ISBN:

88591-34

91

BOX177

I3jîrfalla-Sweden

177

Tel û Fax:

8-583 564 68

6i

8-580

131

Bêî destûra Weşanxaneya Nûdemê, jinûveweşandin, an jî weşandina di kovar û

rojnameyan de qedexe ye.

NAVEROK

Pêşgorin 7

Mîr Şahriyar û birayê wî Mîr Şahzeman 9

Ker û Ga 14

Bazirgan û Efrît

18

Çîroka Kalê Yekemîn 20

Çîroka Kalê Duyemîn 23

Çîroka Kalê Sêyemîn 26

Çîroka Ganem bin-Eyûb û Xweha wî Fernahê 29

Çîroka Reşikê Xesandî yê Yekemîn ji Sûdanê 33

Çîroka Reşikê Xesandî yê Duyemîn ji Sûdanê 36

Hemal û Keçikên Ciwan 67

Çîroka Parsekê Yekemîn 80

Çîroka Parsekê Duyemîn 86

Çîroka Parsekê Sêyemîn IOI

Çîroka Keçika Ciwan ya Yekemîn II8

Çîroka Keçika Ciwan ya Duyemîn 127

Dawî

135

ÇEND GOTIN

Di

demeke kevin de siltanek hebûye. Xatûneke siltên a pir spehî hebûye ku siltên ji her tiştên li ser rûyê dinyayê bêtir jê hez dikir, bi gotina wê dikir, yeka wê nedikir dudu, ew mîna dil û çavên xwe diparast. Ji ber vê hezkirin û dilşahiyê, siltan ji welatîyên xwe re jî qenc bû, dilovan bû, tade û neheqî li wan nedikirin, dixwest ew jî di nava xweşî û evînê de bijîn. Lê belê bi qasî ku siltan bi xatûna xwe ve girêdayî bû û sadiqê wê bû, xatûna wî jî ew çend nesadiq û li hemberî siltên ne durust bû. Rojekê siltan xatûna xwe di hemêza koleyekî xwe de dibîne. Ew bûyera han siltên dihejîne, dinyayê li ber çavên wî reş dike, ew hema şûrê xwe ji ber xwe dikişîne û serên herdiwan jî difirîne. Îcar ji berdêla nermahî û dilovaniyê ew dibe mirovekî sert, bêwijdan û bikîn û nefret. Welatê xwe yê wek bihuştê li welatîyên xwe dike dojah, li hemberî jinan bi gir dibe û jinan mîna benderuhên neqenc û xapînok dibîne. Loma jî ew her jina ku pê re dizewice, di berbanga dotira rojê de dikuje. Rojekê, keça wezîrê siltên, Şehrezad ji bavê xwe daxwaz dike ku bi siltên re bizewice. Bavê wê li hemberî daxwaza wê derdikeve û naxwaze ku keça wî roja piştî dawetê were kuştin. Lê wezîr ji ber Şehrezadê nake der û Şehrezadê pêşkêşî siltanê xwe dike. Şehrezada ku bi bîaqilî û spehîbû-

na xwe navdar e, ji siltên daxwaz dike ku xwişka wê Dinyazade jî li ba wê razê da ku di ber dilê wê bide. Siltan daxwaza xatûna xwe Şehrezadeyê qebûl dike û destûra xwişka wê Dinyazadeyê dide. Gava Dinyazade bi şev tê ba Şehrezadeyê, ew digirî, li xwe dixê, porê xwe dikişîne; lê xwişka wê Şehrezade wê teselî dike, serê wê datîne ser çonga xwe û jê re çîrokekê dibêje. Di vê navê de siltan jî şiyar dibe, xwe dide ser enîşkên xwe û bi balkêşî li çîroka Şehrezadeyê guhdarî dike. Çîroka wê ewqasî bi kelecana,

ku hem devê siltên, hem jî yê Dinyazadeyê ji hev dimîne û ew di cîhana fantaziyan de derdikevin rêwîtiyên dirêj. Gava tîrêjên rojê davêjin hundur, celad derî vedike ku Şehrezadeyê bibe û serê wê jê bike, lê siltan nahêle û dixwaze li dewama çîroka wê guhdarî bike. Şehrezade şeva piştî wê jî dewama çîrokê dibêje, lê dîsan gava sibehê zû celad derî vedike da ku wê bibe û serê wê jê bike, dîsan siltan nahêle û dixwaze li dewama çîroka wê guhdarî bike. Ev yeka han welê dom dike û Şehrezade hezar û şevê, her şevê ji siltên re çîrokekê dibêje. Di hundurê vê demê de ew ji siltên re lawekî jî tîne dinyayê û li ber dilê siltên bêhawe şêrîn dibe. Siltanê bêwijdan û dilkevir, dîsan nerm û dilovan dibe, dîsan bi evîn û hezkirinê difûre û dibe siltanê berê...

Çîrokên di vê kitêbê de hinek ji çîrokên Şehrezadeyê ne ku di hezar û şevê de hatine gotin. Ev çîrokên ku di edebiyata cîhanê de xwediyên cihekî taybeû ne û tesîreke mezin li nivîskarên epoka romantîkê kirine, Serdar Roşan ew kirine malê ziman û edebiyata kurdî. Mîna tê zanîn ev çîrokên han ji hezar û yek çîrokê pêk tên. Vêca ev hezar û yek çîrok di hin zimanan de bûne deh, di hin zimanan de bûne donzdeh û di hinan de jî bûne panzdeh

cild. Bêguman wergerandin û weşandina van hemû cildan ar-
manc û daxwaza me ye. Lê bêî ku em ji rewşê gazinan bikin, em
bi hêvî ne ku em ê di rojên pêş de hemû cildên çîrokên hezar û
şevêkê bi zimanê kurdî jî bixwînin.

Serdar Roşan ev çîrokên han ji zimanê swêdî wergerandine
kurdî. Herçî swêdî ne wan jî çîrok ji zimanê fransî wergerandine.
Bêşik wê pir baştir bûya ku ev çîrokên han ji zimanê orjînal bi-
hatina wergerandin. Lê mixabin îmkanê me tunebû û me xwest
ku wergera van çîrokan ji cihekî dest pê bibe. Digel vê hindê jî
em dikarin bêî dudilî bibêjin ku wergêr Serdar Roşan çîrok bi ki-
rasê zimanê kurdî yê spehî xemilandine.

FiratCewerî

Stockholm, 1998

Mîr Şahriyar û birayê wî Mîr Şahzeman

Tê

gotin -lê belê wek her carê û niha Xwedê zanatir, bi
aqiltir û bi rehmtir e- ku di destpêka çêbûna dunyayê û
hungura demê de, mîrekî bi nav û deng û xwedî hêz li wela-
tê Sasan, di navbera giravên Çîn û Hindistanê de dijiya. Or-
diyên wî, yên mezin û hêzên xurt yên di xizmeta xelkê de
hebûn. Herweha gelek xulam di qesra wî ya mezin de, di
xizmeta wî de bûn. Du kurên wî, yekî mezin û yekî piçûk,
hebûn. Her du jî siwarên jîr û mêrxas bûn; lê belê kurê me-
zin di warê siwarîbûnê de ji yê piçûk jîrtir bû. Yê mezin we-
lat bi edalet îdare dikir; ji ber vê yekê jî xelkê jê hez dikir.
Navê wî Şahriyar, ango şahê bajêr bû; birayê wî yê ku navê
wî Şahzeman, ango şahê zeman bû, li Semarkand el-Ecamê

mîr bû.

Sal di ser salan re derbas bûn; herdu Mîran jî, welatên xwe bi edalet û xweşî idare dikirin û di nav xweşî û bereketê de dijiyan. Lê belê piştî bîst salan birayê mezin bi awayekî nedîtî bêriya birayê xwe kir û emir da wezîrê xwe da ku biçe birayê wî bîne. Wezîrî got: "Ser seran û ser çavan" û bi rê ket. Bi izna Xwedê, bê dijwarî, wezîr gîhaşt cem birayê piçûk. Ji birayê piçûk re "silavên Xwedê li te bin" got û sebebê hatina xwe diyar kir. Şahzemanî got: "Ser seran û ser çavan." Emir da pêşkar û xulaman da ku haziriya birêketinê bikin. Kon, zexîre, hêstir, deve û pêwistiyên rê yên din hatin hazirkirin. Paşê Şahzemanî îdareya welêt da destê wezîrê xwe û bi rê ketin.

Lê êvarê, dema bêhnvedanê, hate bîra Şahzemanî ku tiştê li qesra xwe ji bîr kiriye û bi nêhînî vegeriya wir. "Wî, di qes-

rê de, jina xwe li ser dîwanê vekerî, di hembêza koleyekî xwe î reşik de, dît. Bi dîtina wê dîmenê re dunya li ber çavên wî reş bû û weha fikirî: Hîn ez bi rêk û pêk ji bajêrderneketime ev jinik weha zinayê dike, Xwedê zane gava ji bo demeke dirêj ez ji bajêr derdikevim ew çî dike. Hema şûrê xwe kişarid û ew herdu jî li ser dîwanê kuştin. Tawil vegeriya cem rêwiyên û emir da, da ku bi rê kevin! Bêwestan ber bi bajarê birayê mezin çûn, heya gîhaştin wê derê.

Mîr Şahriyar bi bihîstina hatina birayê xwe gelekî kêfxweş bû û emir da, da ku bajar bo xatir û şerafa birayî bête xemilandin. Ji bajêr derket, çû pêşiya birayê xwe da ku bixêrhatinê lê bike. Piştî hevdîtin û hevpirsînê, Şahriyar bi dilxweşî bi

birayê xwe re dipeyvî. Lê belê, Şahzeman bêkêf bû; ji lewre kirina jina wî ji bîra wî nediçû; dunya li ber çavên wî reş bû-bû, rûyê wî zer û laşê wî diricifî. Mîr Şahriyar rewşa birayê xwe fêrî kir, lê belê wî texmîn dikir ku ji ber bêriya welêt welê li birayê wî hatiye, ji ber vê yekê jî, ji birayê xwe, sebebê vê yekê pirs nekir. Lê rojekê nema xwe ragirt û ji Şahzemanî pirsî:

"Ax bira, ez nizanim çî ye, lê di vê rewşê de welê rengzer û lawaz xuyabûna te min diêşîne." Şahzemanî bersîv dx "Belê bira, derdê min gelekî giran e." Lê wî çu tiştê der heqê kirina jina xwe de negot. Mîr Şahriyar got: "Ma tu naxwazî bi min re werî, em bi hev re tevî peya û siwaran herin nêçîrê? Mimkin e, çş an derdên te piçekî kêr û sivik bibin." Lê Şahzemanî nexwest bi birayê xwe re here nêçîrê, ji lewre Şahriyar bê birayê xwe çû nêçîrê.

Li qesrê gelek pencereyên ku berê wan li bexçeyê serayê bûn, hebûn. Rojekê gava Şahzeman li ber pencereyekê rûniştî, li derve mêze dikir, wî dît ku vaye, bîst koleyên mêr û bîst jî yên jin di nav wan de bi hemî serbilindî û spehîtiya xwe ve jina mîr Şahriyar, hatin nav bexçe. Li ber bendaveke

10

piçûk sekinîn û hemiyên kincên xwe ji xwe kirin. Jinmîrê gazî kin "Masûd!" Piştî lehzeyekê, reşikekî bi bejnûbala û zendûbendan bi bezîn hat cem wê û wan hevûdu hembêz kir... Reşikî ew li ser piştê vezeland û bi wê re ket nava kêf û zewqê. Bi vê îşaretê re her koleyekî mêr xwe dirêjî yeke jin kir. Wan, ew lîstikên kêf û zewqê heta ber bi êvarê doman-

din.

Bi dîtina van tiştan re Şahzeman fikirî: "Weleh ya hatibû serê min li ber vê yekê ne tişteke e." Bêmurûziya wî winda bû, dest bi xwarin û vexwarinê kir û fikirî: Bi rastî ev bûyer ji ya min gelekî xirabtir e.

Li dawiyê birayê wî Şahriyar ji nêçîrê vegeriya, hat serayê; dît ku rûyê Sahzemanî vebûye, rengê wî xweş e; û vaye bi mad xwarinê dixwe, -yê ku demeke dirêj bû tişteke nedixwar. Şahriyar ecêb ma û pirsî: "Ax bira, demek berê tu bêmirûz û rûyê te zer bû, lê niha cardin rengê rûyê te xweş e. De ka bêje, çi ye, çi qewimî?"

Şahzemanî bersîv da: "Ez dê ji te re sebebê bêmirûziya xwe bêjim lê, tu, ji min sebebê rûgeşiya min mepirse. Gava te wezîrê xwe şand pey min û piştî ku ez ji bajêr derketim, hat bîra min; ew mucewherê ku min dê bi diyarî ji te re bianiya, min li malê ji bîr kiribû. Ez vegeriya serayê û min jina xwe li hembêza koleyekî reşik li ser dîwanê dît. Min ew herdu jî kuştin û ez hatim cem te. Lê min fikir ne fikir, ew bûyer ji bîra min nedîçû; ji lewre ez bêmirûz bûm û her ku diçû ez lawaztir dibûm. Lê bi izna te be ez behsa sebebê rûgeşiya xwe nekim."

Gava birayî ev bihîst, got: "Weleh, divê tu bêjî!" Wê gavê Şahzemanî ew hemî tiştên ku ji pencereyê dîtibûn gotin; Şahriyar bi qêrîn got: "Divê, ewil ez bi çavên xwe bibînim." Birayê wî got: "Baş e. Ji derûdorê re bêje, tu dê herî nêçîrê, lê were cem min û xwe veşêre, bi vê şêweyê tu dikarî bi çavên

ii

xwe bibînî û bawer bikî."

Şahriyarî taviê emir da telalên xwe da ku fêrmana wî ya ji bajêr bi dûrketinê eşkere bikin. Esker tevî konan ji bajêr derketin. Mîr jî bi wan re çû, di konê xwe de ji koleyên xwe yên ciwan re got: "Nehêlin, bila kes neyê hundir cem min!" Paşê cilên xwe guhertin, bi nihênî ji binê kon derket û berê xwe da serayê. Li ber pencereyeke li hêla bexçe rûnişt, piştî saetekê jina wî, tevî koleyên jin û mêr, hat nav bexçe. Wan ew tiştên ku Şahzemanî gotibû hemî bi kêfxweşî kirin, heya roj çû ava.

Gava Şahriyar ev tişt dîtîn, aqil ji serê wî çû û ji birayê xwe re weha got: "Rabe em ji vir herin, em mêze bikin ka Xwedê di qedera me de çi nivîsiye. Heya em yekî ku wekî me tişt hatine serê wî nebînin, divê em hukumdariyê nekin. An na mirin ji vî halî çêtir e."

Birayê wî bersîv da û ew bi hev re ji qesrê derketin bê ku kesek bi wan bihese. Şev û roj meşiyên heya gîhaştin qeraxa deryayê. Li wê derê darek û kaniyeke ku xwişîna ava wê bû dîtîn. Ji kaniyê av vexwarin û li bin darê ji bo bêhnvedanê rûniştin.

Berî ku demeke dirêj bibore, xumîn bi deryayê ket û ji nişkê ve ewrekî reş jê bilind bû û ber bi qeraxê hat. Ew pirr tirsîyan û hilkişîyan ser darê, xwe di nav şaxan de veşartin da ku bibînin ka ew çi ye. Wê gavê, ew ewrê ku dişibiya stûnekê, bû efrîtek, yekî dirêjî bi heybet, nav milên wî fireh û sîng pahn. Li ser serê wî sandoxek hebû. Wî piyên xwe dan erdê, meşiya hat li bin darê, -ya ku herdu birayan xwe di nav şaxên wê de veşartibû-. Sandox vekir, ji nav wê, sandoxeke din

derxist û qapaxa wê vekir. Ji sandoxê keçikeke ciwan û spehî ku wek rojê bû, derket. Efrîtî demeke dirêj li wê mêze kir û got:

"Ax, delala min, ez xulam, tu, ya ku min di roja daweta te 12.

de, min te revand, dixwazim piçekî rakevim.!" Efrîtî serê xwe danî hembêza keçikê û di xew re çû.

Keçikê serê xwe rakir û li darê mêze kir; wê ew herdu Mîrên di nav şaxên darê de veşartî dît. Tawil serê efrîtî ji hembêza xwe rakir û danî erdê. Rabû ser xwe, bi îşaretan wek ku ji wan re bêje: "Dakevin, werin xwarê, ji vî efrîtî netirsin!"

Wan jî bi îşaretan got: "Xwedê bi te re be, bi izna te, em tevî vê talûkeyê nebin!" Wê bersîv da: "Bila Xwedê bi we herduyan re be, lê belê lez bikin, an na ez dê efrîtî şiyar bikim, ew dê bi bobelatan we bikuje!" Ew tirsîyan û ji darê daketin; keçik ber bi wan çû û got: "Lez kin, rimên xwe bihêz û xweşî bikutin min, an na ez dê efrîtî şiyar bilcim!" Şahriyarî bi tirs ji Şahzemanî re got: "Ax bira, tu ewil vî karî bike." Lê birayê wî bersîv da: "Na, tu birayê mezin î, divê ez her di riya te de bim." Bi îşaretên dest û çavan ji hev re gotin, eger ew daxwaza wê bi cih neyînin dê çi bê serê wan, ji ber vê yekê emrê keçikê bi cih anîn. Piştî ku lcarê xwe xilas kirin, keçikê got: "Hûn herdu jî jîr in!" Paşê keçikê ji bêrîka xwe kîsek derxist ku gerdaneke ji pêncsed moran pêkhatî têde bû. Keçikê got: "Hûn dizanin ev çi ye?" Gotin: "Na." Wê got: "Xwediye van moran hemî bi min re raketine û her yekî qiloçek nediyar li efrîtî zêde kiriye. Ji lewre divê hûn herdu bira jî morên xwe

bidin min." Wan morên xwe dan wê û wê got: "Vî efrîtî roja ku daweta min bû ez revandim û xistim hundirê vê sandoxê, sandoxa piçûk xiste nav ya mezin û bi heft birmeyan kilît kir; û sandox bera bin deryayê da; lê wî nedizanî heke jinek daxwaza tiştê bike, çu tişt nikare pêşî lê bigire."

Bi bihîstina van gotinên keçikê re, herdu bira pirr ecêb man û ji hev re gotin: "Eger ev tişt tîn serê efrîtekî wek vî efrîtî, -ku mizir û xwedî qudret e- ev tişt ji yên me pirr xirabtir in, divê em cardin şukir bikin."

Piştî van gotinan, herdu birayan xatir ji keçikê xwest û her 13

yekî berê xwe da bajarê xwe.

Gava Mîr Şahriyar gîhaşt seraya xwe, serê jina xwe û wan hemî koleyan da jê kirin. Emir da wezîrê xwe da ku herşev jê re keçikeke bakîre peyda bike û bîne serayê. Êdî herşev Şahriyar bi qîzeke bakîre re radiza û serê sibê ew dikuşt. Sê sal bi vî awayî borîn. Di nav xelkê de nerazîbûn û şaşbûnekê rû da, yên ku keçikên wan hebûn terka bajêr kirin. Welê lê hat ku li temamê bajêr tenê keçikek jî nema.

Lê belê du qîzên wezîrê hebûn ku pirr spehî û şêrîn bûn.

Ya mezin navê wê Şehrezad, ango qîza bajêr; û ya piçûk, navê wê Duniyazad, ango qîza duniyayê, bû. Şehrezadê hema bêje hemî pirtûkên heyî xwendibûn û dihate gotin ku hezar pirtûkên wê yên ku behsa mîr û xelkên berê û şaîran dikin, hebûn. Ew bi şêweyeke xwes û nerm diaxifî ku mirov ji dil û bi kêfxwesî guhdariya wê dikir. Wê ji bavê xwe re got: "Tu çima welê bêmirûz û bêkêf î, mirov dibêje qey te barê hemî

dunyayê hilgirtiye. Wek şaîr dibêje: "Tu, yê xemxwar, piçekî bi kêf be, ji lewre çu tişt ne abadîn e, çawa kêfxweşî winda dibe, herweha xem jî tîn ji bîr kirin."

Wê gavê wezîr bûyera der heqê Mîr ji serî heya dawiyê ji wê re got. Paşê Şehrezadê weha got: "Xwedê mezin e, bavo min bide Mîr, an ez ê bêm kuştin an jî ez ê hemî qîzên mayîn ji kuştinê rizgar bikim." Wezîr got: "Xwedê alîkarê te be! Xwe meavêje nav vê talûkeyê!" Lê wê got: "Na, ez mecbûrê vê yekê me." Wezîr got: "Haya te ji te hebe ku eqîbeta 'ker û ga' neyê serê te." O dest pê kir:

Ker û Ga

H

ebû, tunebû, di demekê de gundiyeke ku gelekî dewlemend û xwedî pez û dewar bû, hebû. Ew zewicî û ge-
14

lek zarokên wî hebûn. Bi izin û qudreta Xwedayê mezin, wî gundiyeke ji zimanê heywanan fam dilcir; lê diviyabû ku ji çu kesî re ev qudreta xwe eşkere nekira. Xaniyê wî li kêleka çemekî li herimeke herî baş yê tîzad bû. Û gayek û kerelcî wî jî hebûn.

Rojekê, gundî li pişra gayî siwar ji gerê vegeriya malê; gayî, ker ziktêr, binê wî paqijkirî û afirê wî bi ka û ceh tije dît.

Gundî, tiştê ku ga ji kerê re digot, bihîst: "Xwarina te, ji te re afiyet û şîfa be. Dema ez westiyayî û ji hal ketime, tu li isterehet î, afirê te tije ye, tu cehê paqij dixwî û binê te paqij dikin, herçiqa xwediyê me li te jî siwar dibe, lê ne hertim. Lê ez an li bin nîr an jî di nav gêreyê de me." Kerê bersîv da:

"Gava ew nîr bidin ser stoyê te, xwe biavêje erdê, ew li te bixin jî ramebe. Eger te rakin jî, tu xwe cardin biavêje erdê. Heke te bînin malê û kizinan jî bidin te, mexwe; xwe li nexweşiyê deyne. Çend rojan li ber xwe bide û xwarinê mexwe, bi vî awayî tu dilcarî ji zehmetiya kar xwe bi dûr bixîni û isterehet bikî."

Gundiyê xwediyê wan her tişt bihîst.

Gava xulamek hat û ka xiste afirê gayî, wî dît ku ga wek her carî naxwe; serê sibeyê wexta ga birin nav zeviyê, wî dît ku ga nexweş e. Xwediyê malê got: "Kerê bîne, li şûna gayî, têxe bin nîr û pê cot bike." Xulêm çû ker anî, heta êvarê pê cot kirin.

Êvarê gava ker anîn malê, li êxur, gayî ji wî re gelekî spas kir; ji lewre fersenda bêhnvedanê bi saya wî bi dest xistibû. Lê kerê bersîva spasiya wî neda; berevajî ew ji şîretên xwe gelecî poşman bû bû.

Roja din, cotlcar hat, ker bir heta êvarê pê cot kir. Êvarê, çermê stoyê kerê rabûyî û pîrr westiyayî hat êxur. Gava gayî ker di wê rewşê de dît, spas kir û pesnê kerî da. Lê kerê bersîv da û got: "Berê, jiyanekê min e rehet hebû, de lca bibînin, is

ji bo min çeyî kir ez ketime çî halê. Ez ê şîreteke bas li te bicirn. Min bihîst, xwediyê me digot, "heke ga rehet nebe, divê em wî ser jê bikin, qe nebe çermê wî bikar bînin. Bi rastî ez gelekî li ber te dikevim. Ez vê yekê ji te re dibêjim da ku tu karibî xwe xilas bikî."

Gava gayî ev tişt bihîstin, spas lcar û got: "Sibeyê ez ê bi

kêfxweşî bi we re bêm û karê xwe yê edetî bilcim." Gayî, bi kêfxwejî û şadî, dest pê kir hemî êmê li afirê xwe xwar. Xwediyê malê yê ku ji zimanê heywanan fam dikir ev tişt hemî bihîstin.

Serê sibeyê xwediyê wan û jina wî li ber xênî rûnistîbûn. Gava xulam hat û ga ji êxur derxist, wan dît ku ga, dûvê xwe dihejîne, lotikan dide, kêf kêfa wî ye. Xwediyê wan gava ev tişt dît, pirqînî pê ket û her keniya; jina wî jê pirsî: "Tu bi çi dikenî?" Wî bersîv da: " Ez bi tişteki ku dibihîzim û dibînim dikenim; lê belê ez nikarim behs bilcim, ez bilcim, ez ê bimirim." Lê jina wî got: "Tu mecbûr î ji min re bêjî, heke tu di cih de bimirî jî." Wî got: "Heyran, ez ji mirinê gelekî ditirsim."

Lê wê her dubare lîcîr: "An na tu henekên xwe bi min dikî." Ji ber pit-pita jina xwe, wî êdî nedizanî çi bike. Gazî zarokên xwe kir, ji bo hazirkirina wasiyeta xwe şand pey qadî, ji ber ku ji jina xwe ku dotmama wî û diya zarokên wî bû, gelekî hez dilcîr û nedixwest dilê wê bihêle. Herweha şande pey mirovên jina xwe û gazî hemî cîranan kir û ji wan re got ku bi eskerekirina şira xwe ve dê bimire. Wê gavê yên ku hazîr bûn, hemîyan pêkve ji jina wî re gotin: "Xwedê alîkarê te be, lê êdî guh nede vî tiştî, dev jê berde, înadê neke. Herhal tu naxwazî mîrê te û bavê zarokên te bimire." Lê wê got: "Na, çu xilasiya wî nîne, divê ew sirra xwe bêje, heke ew tavil bimire jî." Wê gavê çu kesî êdî deng nekir. Paşê mîrê wê rabû ser xwe, çu destmêj girt, vejeriya da ku sirra xwe eşkere

bike û bimore.

Dîkelcî malê, yekî ku pêncî mirîşk li ser sergoyê wî bûn; û daxwaza dilê wan hemiyan bi cih dianî; û herweha segekî wan hebû. Gava xwediyê malê çû derve, bihîst ku vaye seg diqîre û ji dîk re dibêje: "Ma tu şerm nalcî, dema xwediyê me ê bimore, tu kêfê dikî?" Dîk pirsî: "Te got çî?" Piştî ku segî temamê meseleyê ji dîk re eşkere lçir, dîk weha got: "Ez bi navê Xwedê sond dixwim, xwediyê me kêma aqil e. Ê min pêncî mirîşkên min hene, ez hemiyan îdare dikim, gava ez yekê kêfxweş dikim, yeke din, didim ber gotinan. Lê yê wî yek tenê ye jî, nizane ka dê çî bike. Tiştê ku pêwîst e, divê ew here derve şiveke ter bîne û bi bayê bazdanê here hundir, berî ku jina wî devê xwe veke û tobe bike, têra xwe li wê bixe. De ka ez wê gavê bibînim ew diwêre ji wê û pêve pit pitê bike." Gava xwediyê malê ev tişt bihîstin, hiş hate serê wî, biryara xwe da, da ku jina xwe bide ber çoyan...

Wezîr li wir sekinî û ji qîza xwe Şehrezadê re got: "Mim- lcin e, tiştê ku hatin serê wê jinikê, Mîr jî bîne serê te." Şehrezadê ji bavê xwe pirs lçir: "Ma wî gundiyî çî lçir?" Wezîr got:

"Xwediyê malê şiveke ter jê lçir, rahiştê û çû hundir, gazî jina xwe lçir û got: "Here odeya xwe, gava ez sirra xwe ji te re bêjim, ez naxwazim kesekî din min bibîne; paşê jî, bila ez bi dilelcî rehet bimirim." Bi hev re çûn odeya jinikê, mêrê wê derî lçilît kir û dest avêt şivê û hema bêje ji xwe çûyî, ew da ber şivan. Jina wî diqêriya û digot: "Tobe, tobe, ez poşman im." Destê mêrê xwe radimûsa, xwe diavêt piyên wî û poşmaniya xwe bi her awayî nîşan dida. Paşê bi mêrê xwe re hat

derve cem mêvanan. Mirov û cîranên wan gelecî kêfxwes bûn; mêr û jina wî bi şêweyeke bextewar heya mirinê bi hev rejiyan."

Wezîrî bi vî awayî gotina xwe bi dawî anî. Qîza wî Şehre-
*7

zadê got: "Ax bavo, ez hêvî dilcim ku tu ê izna min bidî da ku daxwaza min bi cih were." Wê gavê êdî wezîr tişteki dijî wê negot. Wezîrî emir da xulaman ku qîza wî bixemilînin. Wezîr rabû çû cem Mîr Şahriyar da ku xizmeta wî bike. Piştî çûyîna wezîr, Şehrezadê gazî xwişka xwe Icir û jê re weha got: "Gava ez herim cem Mîr, ez ê bişeyînim pey te, were serayê, piştî ku Mîr bi min re raza, tu yê bêjî: Xwişka delal, çîrokeke xweş ku em şevên dirêj pê diborînin, ji me re bêje! Wê gavê ez ê ji te re çîrokan bêjim; inşelah ê bibe sebebê xilasiya qîzên pak û delal."

Paşê bavê Şehrezadê hat malê da ku wê ji Mîr re bibe... Çûn serayê. Li serayê, Mîr pirr kêfxweş bû û ji wezîr re got: "Tu her daxwaza dilê min bi cih tînî." Wezîr got: "Belê, Mîrê min, ez xulam."

Wexta Mîr xwest bi wê re rakeve, keçik giriya. Mîr jê pirsî: "Xêr e, çi ye?" Wê got: "Ax Mîrê min, xwişkeke min a piçûk heye; ez dixwazim xatir ji wê bixwazim." Mîr şand pey xwişka wê ku derhal hat û xwe avêt stoyê Şehrezadê...

Mîr bi Şehrezadê re raket...

Paşê, dest pê Icirin û bi dilxweşî ketin nav sohbetê. Dunyazadê ji Şehrezadê re got: "Xwedê bi te re be, xwişka delal; ka çîrokekê bêje da ku şev pê bibore." Şehrezadê bersîv da:

"Delala dilê min, heke Mîrê me yê dilovan izin bide, ez ê bêjim." Mîr yê ku xewa wî nedihat, bi bihîstina van gotinan re, ji guhdarîkirina çîroka Şehrezadê xwe neda paş.

Û Şehrezadê şeva yekemîn dest bi gotina çîrokê kir:

Bazirgan û Efrît

Îrê delal, tê gotin ku di demekê de, bazirganekî pirr

M

dewlemend hebû ku li gelek welatan dukanên wî he-

18

bûn.

Bazirgan rojekê li hespê xwe siwar bû û berê xwe da yek ji wan welatan. Li ser riya wî, gava germahî zêde bû, ew li bin darekê selcinî, rûnişt û ji tûrê xwarinê nanek û çend xurme derxistin. Piştî ku xurme dixwar, dendikê wan diavêt. Di wê gavê de efrîtekî mezin peyda bû, qevda şûr di dest de, şûr dihejand û diqêriya: "Rabe ser xwe, te çawa lawê min kuşt, ez ê jî welê te bikujim!" Bazirgên got: "Çi, ma min kengî lawê te kuştiye?" Efrîtî got: "Ew dendikên xurmeyan yên te diavêt, li sînga lawê min ketin û ew pê mir." Bazirgên got: "Insaft efrîtekî mezin, ez mirovekî mumîn im; û nikarim derewan bilcim. Lê belê, ez pirr dewlemend im, jin û zarokên min he ne û herweha di bazarê de malê min heye. Bi izina te be, ez dixwazim vegerim mala xwe, xatir ji wan bixwazim, hesabên xwe tamam bikim. Gava karê min xilas bibe, ez ê vegerim, wê gavê tu min dikujî, dihêlî tu dizanî. Xwedê şahidê min e ku ez ê li ser soza xwe bisekinim."

Efrîtî ji bazirgên bawer kir û rê da wî, da ku ew here.

Bazirgan vegeriya welatê xwe, hesabên xwe sererast kirin. Paşê sirra xwe eşkere kir. Bav, dê, jin, zarok hemiyana dest bi girî kirin. Bazirgên wesiyeta xwe nivisî û li cem malbata xwe heya dawiya salê ma. Wê gavê rabû ser xwe, kefenê xwe avêt ser piyê xwe, ji malbata xwe, ji cîranan, hevalan û mirovên xwe xatir xwest û bi fikirên bêhêvî berê xwe da cihê ku dê ef-rît bidiya. Hemî nas û dost û mirovên wî giriyan, lîcîrin qêrîn û hewar.

Bazirgan bi rojan bi rê ve çû û hat gîhaşt cihê xwe yê berê. Roja serê salê bû. Dema ew rûniştî û bi rewş û qedera xwe de digiriya, lîcalekî muhterem î bi emir ku benek di dest de, li pey wî xezalek ber bi wî dihat. Wî silav da bazirgên û jê re jî-yaneke dirêj û bextiyar daxwaz lîcîr. Û jî bazirgên pirsî: "Ma xêr e, çima tu welê bi tenê li vî warê cinan rûniştî yî?" Bazir-19

gên meseleya xwe hemî jî wî re got, lîcalo gelekî ecêb ma û got: "Weleh, birayê min, te dînîtiyeke mezin kiriye û meseleya te ecêb e, eger bê nivîsîn ê gelek zane li ser bifikirin û jê dersê wergirin." Kalo rûnişt û dest bi axaftinê kir, lê wî dît ku bazirgan ne li ser hişê xwe ye, di nav dehşet, tirs, xem û şaşbûnê de ye. Wê gavê lîcalekî din ku benek di dest de û li pey wî du kûçik hat; wî jî silav da û jî wan pirsî lîca ew jî bo çî li wî warê cinan sekinîne. Wan, jî wî re mesele jî serî heta dawî got. Bi rûniştina kalo re, kalekî din jî hat ku hêstirek gewrezer pê re bû. Kalo silav da û jî wan pirsî, ka jî bo çî rûniştine. Jê re meseleya xwe gotin; ya ku ne hewce ye em dubare bilcin.

Dema ew li wê derê rûniştîbûn, bayek rabû, gijolek çêbû û ber bi wan hat. Li nêzîkî wan gijolek ji hev çû, efrîtek peyda bû ku sûrelcî tûj di destê wî de bû. Ji çavên efrîtî pêt diçûn, bi bazirgên girt û qêriya: "Were, te çawa lawê min, -yê ku roniya çavên min bû- kuşt, ez ê jî welê te bikujim." Wê gavê bazirgên dest bi girî kir û bû miz miza wî; herweha wan her sê kalan jî nerazîbûna xwe nîşan dan û kelogirî bûn.

Kalê yekemîn, xwediyê xezalê, destê efrîtî ramûsa û got:

"Ey efrît, mîrê cinan, eger tu ji sêyan yekê jiyana vî bazirganî bibexşînî, bidî min, ez ê çîroka vê xezalê bêjim, tu ê ecêb biminî." Efrîtî got: "Belê, lcalê muhterem, çîroka xwe bêje, heke hêja be, ez ê ji sêyan yekê jiyana vî mirovî bibexşînim."

Çîroka Kalê Yekemîn

Kalê yekemîn dest pê lcir:

"Ey efrîtê mezin, bizane ku ev xezal qîza xwezûrê min bû, gava ez bi wê re zewicîm, em ciwan bûn; me sîh sal bi hev re borand. Lê Xwedê çu zarok nedan me. Ji ber vê yekê min ji
20

xwe re cêriyek anî. Xwedê lawek, mîna heyveke li ber derketinê, yekî bejin li hev, çav mezin û bi birûyên dirêj, da me. Gava kurê min bû panzdeh salî, ji ber lcarekî xwe ez çûm bajarelçî dûr.

Qîza xwezûrê min, ev xezal di zaroktiya xwe de ferî sihêrbaziyê bûbû; û bi wê hunera xwe, wê sihêr avêt ser kurê min û ew lcir conagayek û diya wî jî çêlekek; û gavanek jî ji bo li wan miqatebe peyda kir. Gava ez piştî demeke dirêj vegeyriyam malê, min pirsra kurê xwe û diya wî kir, jina min, vê xe-

zalê, bersîv da: "Cêriya te miriye û kurê te jî ji vir çûye, lê ez nizanim lca ew bi ku de çûye."

Min salek, bi rewşeke pîrr xirab, sergêj û perîşan bi kul û keder borand. Di salvegera windabûna kurê xwe û mirina cêriya xwe de, min ji gavên re got; ku here çêlekeke qelew û baş bîne; gavên çû cêriya min ya ku jina min bi sihrê lçiribû çêlek, anî. Min destên xwe şûştin, ziwa kirin û kêrek hilda da ku ez çêlekê ser jê bilcim. Lê wê gavê orînî bi çêlekê ket û giriya. Min dev ji serjêkirinê berda û emir da gavên ku ew wî karî bike. Gavên ew ser jê lçir. Paşê gavên ew gurand, lê belê çêlek bêgoşt û bêbez bû; hema bêje hestî û çerm tenê bû. Bi qurbankirina wê, ez poşman bûbûm lê çi heyf. Min çermê wê da gavên û emir da wî ku ciwangayekê qelew bîne. Wî çû kurê min yê ku bi sihrê bûbû conega anî.

Gava conegê ez dîtîm, ber bi min hat û xwe avêt ber piyên min. Çi orîn û nalîn! Dilê min pê şewitî; min ji gavên re got: "Here çêlekeke din bîne, vî conegayî berde bila here nav de-warên din."

Ey, mîrê mîran yê cinan, ev tişt hemî qewimîn, ev xezal, qîza xwezûrê min, li wir li cem me bû, wê dît ku ez conegê berdidim, wê got: "Na, divê em conegê ser jê bikin...!" Lê ji ber ku dilê min gelekî bi conegê dişewitî min bi ya wê nelcîr û min emir da gavên ku conegê bibe. Gavên ew bir.

21

Roja dinê, gava ez li mala xwe rûniştîbûm, gavan hat hundir û got: "Ez xulam, ez ê ji te re tişteki ku ê te kêfxweş bike, bibêjim û ez xelata xwe ji te dixwazim." Min pirsî: "Xêr e?"

Gavên got: "Ez xulam, qîzek min heye. Pîrejineke ku li cem me dimîne ew fêrî sihrê kiriye. Duhî, gava qîza min, conega li pêş min, ez dîtîm, ser û çavê xwe pêça û giriya; û paşê pir-qînî pê ket û got: "Bavo, ma qîmeta min ewqas li cem te ketiye ku tu mirovekî xerîb bi xwe re tînî?" Min jê pirsî: "Kîjan mirovê xerîb? Çima tu ewil giriya û paşê keniyayî?" Wê bersîv da: "Ev conega kurê, efendiyê me yê bazirgan e, damariya wî, ew û dêya wî herdu jî sihêr kirine. Ji ber nêrînên wî yê conegayî min nikarî, ez xwe ragirim û nekenim. Û ez giriya ji lewre diya vî conegayî ji alî bavê wî ve hate qur-bankirin!" Ji van gotinên qîza xwe ez ecêb û şaş mam; heya sibeyê min xwe bêsebir ragirt, da ku sibeyê ez werim cem te û bûyerê ji te re bêjim!"

Kalo got: "Gava min bûyer ji devê gavên bihîst, tavil ez bi wî re vegeriyam, ji filcra dîtina kurê xwe wek vexwarina şerabê ez sermest û gelecî bextiyar û kêfxweş, bûm. Qîza gavên hat pêşiya min, bixêrhatin li min lîcî û destê min ramûsa. Herweha conega ber bi min ve hat û li ber piyên min mexel hat. Min ji qîza gavên pirsî: 'Ma tiştê ku te ji bavê xwe re di heqê vî conegayî de gotine rast in?' Wê bersîv da: 'Belê, ez xulam, ev kurê te, dalalê ber dilê te ye!' Min jê pirsî: 'Ey keçika xêrxwaz, eger tu kurê min rizgar bikî, ez ê mal û milkê xwe bidim bavê tef Bi kenîn wê got: 'Ez malê te bi du şertan qebûl dilcim, yek: ez dixwazim bi kurê te re bizewicim; du: divê tu bihêlî da ku kê bixwazim, min izin hebe, ez wan têxim bin sihrê. An na, ez nikarim xwe ji xirabiyên jina te biparêzim.'

Gava min ev tişt bihîstin, efrîtê mezin, min bersîva qîza

gavên da û got: 'Baş e, bila wek te be; û mal û milkê ku bavê
22

te îdare dike, ez ji we re dibexşînim. Herçî qîza xwezûrê min
e, ez iznê didim te û tu çî bînî serê wê tu serbest î.'

Wê tasek ji paxir yeke piçûk tije av kir, li avê tiştin xwen-
din; û av li conegê reşand û got: 'Heke Xwedê te conega xu-
liqandiye her conega bimîne û neyê guhertin, lê heke tu di
bin sihrê de yî, inşelah tu ê vegeerî halê xwe yê berê; wek ku
Xwedê te xuliqandibû.'

Piştî van gotinên wê, conega bêhuzûr bû, lerizî, hejiya û ji
nû ve bû insan. Ez pêş ve ber bi wî çûm, min ew hembêz kir
û got: 'Xwedê bi te re be. De ka bêje, qîza xwezûrê min, çî bi
serê te û diya te anî?' Wî her tiştê ku qewimîbû behs lîcir; û
min got: 'Ax, kurê min, qeder di destê Xwedê de ye, bi izina
Wî tu xilas bûyî, tu vegeeriyayî halê xwe yê berê.'

Û paşê, efrîtê mezin, min kurê xwe bi qîza gavên re zewi-
cand. Pasê bi saya hunera sihrê, wê qîza xwezûrê min xist
bin sîhirê û ew lîcir ev xezala ku tu dibînî. Dema ez hatim vir,
min ev mirovên qenc li vir dîtin, min ji wan pirsî ka ew li vir
çî dilcin; û min meseleya bazirgên bihîst, ez rûniştim û min
got, de ka ez binêrim, çî tê serê bazirgên. Belê, meseleya min
evbu.

Wê demê efrîtî bi qêrîn got: "Meseleya te gelekî balkêş e,
ji lewre ez ji sêyan yek ji jiyana vî mirovî dibexşînim."

Wê gavê kalê duyemîn, yê xwediyê herdu kûçikan got:

Çîroka Kalê Duyemîn

"Ey mîrê cinan yê li welatê efrîtan, ev herdu kûçik birayên

min in. Gava bavê me mir ji me re sê hezar dînar mîras hîşt. Min bi para xwe dukanek vekir û dest bi kirîn û firotinê lcir. Birayekî min ji bo karê bazirganiyê bi karwanan re çû wela-tên dûr, û salekê tamam bi wan re ma. Gava vegeriya, hat 23

malê, çu pereyên wî nemabûn. Min jê re got: 'Birayê delal, ma min ji te re negot meçe?' Wî dest bi girînê lcir û got: 'Ax birayê delal, hertişt di destê Xwedê de ye; qeder, ez çî bikim. Çî heyf, niha çu fêda gotinên te nîne; ji lewre min tiştêk ne-maye.' Min ew bir dukanê, paşê bir hemamê û paşê ji cawên herî baş cil dan wî. Em rûniştin da ku xwarinê bixwin. Min jê re got: 'Bira, ez ê, bê ku dest bi sermayeya xwe bidim, hatinên dukanê bi te re par ve bilcim.' Me welê lcir; sala ewil hezar dînar hatina me çêbû. Min ji Xwedê re spas kir û bi birayê xwe re, ew hezar dînar, wekhev dabeş lcir. Em li male-kê, li cem hev, diman.

Werhasil birayên min dest pê lcirin û cardin behsa seferê kirin û ji min jî daxwaz lcirin da ku ez bi wan re biçim. Lê min, hercar daxwaza wan red dikir. Bi vî awayî şeş sal çûn, di dawiyê de min got: 'Birayên delal, fermo em pereyên xwe hesab bilcin.' Me hesabê xwe lcir û dît ku li ser hev şeş hezar dînarê me heye. Min ji wan re got: 'Bi izna we be jî, em nivê van pereyan ji bo rojên teng, qeza û belayan hilînin. Paşê me her yek hezar dînar dimîne; em dikarin pê ticaretê bikin.' Wan bi kêfxweşî got: 'Bijî, her bijî, Xwedê bi filcra te re be.' Min pere lcirin du beş, nivê hilaîn; ji yê mayîn me her yekî hezar dînarê xwe hilda. Me tiştên cûrbicûr lcirîn, keştiyek ki-

rê lçir; malê xwe bar lçir; em ketin keştiyê û bi rê ketin.
Piştî mehekê em gîhaştin bajarekî, me malê xwe yek bi deh
dînanan kar, firot. Pajê me terlca bajêr lçir.
Gava em hatin qeraxê deryayê, em pêrgî jineke kinc kevin
û qetiyayî hatin. Ew ber bi min hat, destê min ramûsa û got:
'Ax, efendiyê min, gelo tu dilcarî ji bo karelcî alîkariya min
bikî? Ez ê paşê qenciya te li te vegeerînim.' Min bersîv da: 'Ez
ê alikariya te bilcim, lê ne hewce ye ku tu xwe deyndarê min
bihesibînî.' Wê gavê wê weha got: 'Ax efendiyê min, de lca
min ji xwe re bibe, bi min re bizewice, ez ê bi ruh û canê
24

xwe ji te re xizmetê bilcim, bibim xulama te. Vê qencyê bi
min bike; ez ne ji wan kesan im ku qencyê ji bîr dilcin. Û
divê tu ji halê min yê şerpeze şerm nelcî.' Gava min ev gotin
bihîstin, dilê min pirr bi wê şewitî, lê wek tê zanîn her tişt bi
daxwaza Xwedê ye, her Ew mezin û xwedî qudret e. Min
daxwaza wê qebûl kir; ew bi min re hat, min ji wê re cilên
giranbiha kirîn; li gemiyê xaliyên têrbuha li ber piyên wê ra-
xistin. Min bi hurmet û comerdî bi wê re muamele dilcir.

Paşê, em bi keştiyê ketin rê.

Wê dil ji min bir, û min bi evîneke, ji dil û hinav, ji wê
hez dikir; şev û roj ez bi wê re bûm. Ji birayan ez tenê bi wê
re radiketim. Ji ber vê yekê birayên min hesûdî dilcir. Ji he-
bûn û malê min, ji tiştên min yên giranbiha û ji hertiştî di-
beicîn; û wan sond xwar ku min bikujin; pereyên min bidi-
zin.

Gava rojekê, ez li cem jina xwe razayibûm, bi min û jina

min girtin û avêtin nav deryayê. Jina min di nav avê de şiyar bû, şiklê wê hat guhertin û ket şiklê efrîtekê. Wê bi milên min girt û ez li giravekê danîm. Paşê ew winda bû; şevê te-mam, çu eser ji wê, nexuya. Hungura sibê vejeriya cem min û got: 'Ma tu min nasnakî? Ez jina te me. Bi izina Xwedê, min te ji mirinê xilas lçir. Lê divê êdî tu zanibî ku ez cin im; gava min cara ewil te dît, dilê min ket te; ji lewre her tişt bi daxwaza Xwedê pêk tê, ez ji Xwedê û resûlê Wî bawer dikim. Ligel ku ez wek jineke feqîr û belengaz jî hatim cem te, tu bi min re zewicî; û niha jî, min di dora xwe de, te ji mirinê, ji deryayê xilas lçir. Lê ji birayên te ez gelecî aciz bûme; divê tu izinê bidî min da ku ez wan bikujim.'

Bi gotinên wê ez ecêb mam, ji bo qenciya bi min kiribû, min spasê wê lçir û got: 'Lê heçî kuştina birayên min e, divê pêk neyê.' Paşê min ji wê re ji serî heya bi dawiyê tiştên ku di navbera me birayan de qewimîbûn gotin. Dema wê ev tişt is

bihîstin got: 'Ez ê îşev bifirim herim keştiya wan xerk bikim da ku ew jî bextreş bimirin.' Min ji wê rica kir: 'Xwedê bi te re be, lê welê neke! Çi be jî birayên min in.' Lê, min bêfêde tilca dilçir û ji wê rehm û insaf dipa. Wê ez danîm ser piştê xwe, firiya, wê anî ez li ber xaniyê min, danîm.

Min deriyê malê velçir, ew sê hezarê veşartî ji cihê wan derxist. Min careke din dukana xwe vekir, dest bi lçirîn û firotinê lçir.

Êvarê min deriyê dulcanê girt û ez çûm malê, lê belê min ev herdu kûçik li malê li goşeyekê girêdayî dîtin. Zûrînî bi

wan ket, ber bi min hatin, lê jina min bi bezîn hat: 'Ev birayên te ne.' Min pirsî: 'Kê ew welê kirine?' Wê bersîv da: 'Min ji xwişlca xwe, ya ku di warê sihrê de ji min jîrektir e, rica kir da ku alikariya min bike; wê, birayên te xistin vê rewşê, ew ê deh salan welê bimînin.'

O niha, ey efrîtê mezin, ez li ser rê bûm ku herim cem dişa xwe, ji wê tika bilcim da ku wan ji vê rewşê rizgar bike, ji ber ku deh salên wan tamam bûne. Li vir, ez rastî vî mirovê ciwan û qenc hatim, wî serpêhatiya xwe got, min nexwest ez ji vir herim berî ku ez bizanibim lca ê çi bibe. Belê, meseleya min ev bû."

Efrîtî got: "Bi rastî meseleyeke ecêb e. Ji lewre ez ji sêyan yekê jiyana vî mirovî ji bo te dibexşînim."

Îcar lcalê sêyemîn, xwediyê hêstirê rabû, ber bi efrîtî çû û got: "Ez ê meseleyekê, ji yê wan herduyan ecêbtir bêjim. Di vê para sêyemîn, ji xwîna vî mirovî tu li min bibexşînî."

Efrîtî got: "Inşelah! De ka bêje!"

Çîroka Kalê Sêyemîn

"Ey efrît, serekê cinan, ev hêstir jina min bû. Rojekê, gava ji karê bazirganiyê, piştî salekê ez vegeyriyam, min ew li nav

26

nivînan di hembêza koleyekî reşik de, dît. Ew herdu ketibûn nav kêf û zewqê, bi henekan, bi gotinên şehwetî yek û du teşwîq dikirin... Gava jina min ez dîtîm, hema ji cihê xwe rabû, beziya, kûzelcî avê hilda. Bi kuste pistê tiştin li ser kûz gotin û ew av bi ser min de reşand û got: 'şiklê xwe biguhere û bikeve texlîtê kûçikekî!' Ez tavil hatim guhertin û ketim

şiklê kûçikekî, wê ez ji malê derxistim derve. Ez vir de wir de çûm, dawiyê ez çûm ber dulcana goştfiroşekî. Min dest bi kotina hestiyên ber derî kir, gava goştfiroşî ez dîtîm, wî ez girêdam û paşê bi xwe re birim malê.

Gava em hatin mala wî, qîza wî serûçavê xwe pêça û ji bavê xwe re got: 'Ev çi ye? Tu tevî zilamekî tê cem min?' Bavê wê got: 'Zilamek? Kîjan zilam?' Lê wê got: 'Ew kûçikê hanê insan e, jinekê sihêr avêtiye ser wî, lê ez dikarim sihrê betal bilcim.' Wê gavê bavê keçikê got: 'Xwedê alîkarê te be, qîza min, sihrê betal bike!' Wê rahişt kûzelcî avê, tiştin lê xwend û ava di kûz de li min reşand û got: 'Ji vî texlîtî derkeve û bikeve halê xwe yê berê!' Hema wê gavê ez cardin ketim siklê insanan; min destê keçikê ramûsa û got: 'Heke te jî, jina min, wek ku wê ez xistim bin sihrê, bixista bin sihrê...' Wê gavê, wê tasek av da min û got: 'Heke tu jina xwe raketî bibînî, vê avê li wê bireşîne û daxwaza xwe bêje, ew ê bikeve wî şiklî.' Ez rabûm çûm malê, bi rastî jî min ew razayî dît, min av lê reşand û got: 'şiklê xwe biguhere û bibe hêstir!' Ew tavil hat guhertin û ket şiklê hêstirekê.

Ev hêstira ku tu dibînî, jina min bi xwe ye; ey şahê efrîtan.

Efrîtî berê xwe da hêstirê û jê pirsî: "Ma rast e?" Hêstirê bi serê xwe îşareta 'belê, rast e' da.

Efrît yê ku di dema gotina vê meseleyê de ji kenîn û pirqî-nê dihejiya, para dawî ji xwîna bazirgên jî, ji şêxê sêyemîn re bexişand.

Bidawîanîna vê çîrokê re, Şehrezadê dît ku êdî hungura sibê ye; û ew bi îtîna bêdeng ma, ligel ku izna Mîr hebû da ku ew çîrokan bêje. Lê xwişlca wê Dunyazadê got: "Ax xwişlca min, tu çiqasî xweş, jîndar û ji dil dibêjî." Şehrezadê got: "Bi rastl ev çîrok li ber çîrokên ku ez ê şeveke din bêjim ne tiştê in, heke Mîr min sax bihêle û bibexşîne." Û Mîr fikirî: Qesem bi navê Xwedê heya ez guhdariya çîroka wê nelcim ez wê nakujim.

Şehrezadê xwe kişandibû ser hev û li kêleka wê Mîr veketî, ew şev welê borî. Serê sibê Mîr rabû, çû dîwanê da ku fermanan derxe û lcar û barê îdareya welêt bimeşîne. Ew pêrgî wezîrê xwe hat yê ku kefênek li ser milên wî; û bawer dikir ku qîza wî niha zûde hatiye kuştin. Mîr dengê xwe nelcir; meşiya çû dîwanê. Hin karmend ji lcar avêtin, hinên din xistin kar; heya êvarê bi tiştên welê ve mijûl bû. Wezîr jî, li wê derê pirr ecêbmayî, hazir bû.

Piştî bi dawîanîna kar û barên li dîwanê, Mîr vegeriya qesra xwe. Gava şeva duyemîn dest pê kir, Dunyazadê ji xwişlca xwe Şehrezadê re got: "Xwişka delal, de ka çîroka bazirgan û efrîtî heya dawiyê bêje." Şehrezadê got: "Bila be, delala dilê min, heke Mîr izin bide." Mîr got: "Tu dikarî bêjî. Izina te heye..."

Wê dest pê kir:

Mîrê zana yê ku bi cesaret û edaleta xwe navdar e, tê gotin ku gava kalê sêyemîn meseleya xwe xilas kir, efrîtê ku ji ber kenîn û pirqînan dihejiya, weha got: "Ez para sêyemîn ji xwîna vî mirovî, didim te; û bazirgan jî azad e."

Bazirgên ji her sê kalan re jî spas lcar. Wan jî ji mirinê riz-

garbûna wî pîroz û daxwaza serkeftinê lçir. Û her yek ji wan bi riya xwe de çû.

"Lê belê" Şehrezadê got; "ev çîrok li ber çîroka ku ez ê niha bêjim ne tiştêk e."

28

Mîr pirsî: "Ew çi çîrok e?"

O Şehrezadê dest bi gotinê lçir:

Çîroka Ganem bin-Eyûb û Xweha wî Fetnahê

Û Şehrezadê got:

Min bihistiye, ey mîrê delal, di destpêka wextê de, li berbanga sedsalan, ji bazirganan bazirganekî gelecî dewlemend hebû; ku bavê du zaroyan bû. Navê wî Eyûb û navê kurê wî Ganem bin-Eyûb bû; û navê wî yê ku ew paşê pê dihat nas- kirin el-Motim el-Maslub bû. Wek heyveke çardehê lewend û mirovekî jîrek, bi dîrayet û bi aqil bû. Qîza wî, xwişka Ganemî, navê wê Fetnah û bêsinor spehî bû.

Gava bavê wan, bazirgan Eyûb, mir, ji zaroyên xwe re gelek mîras hişt. Di nav mîrasê de, sed bar ji cawê hevrîşîm û gelek tiştên xemlê û neqîşkirî hebûn. Caw hemî balyekirî bûn, li ser balyeyan bi herfên mezin: Bo Bexdayê nivisandî- bû. Ji ber ku bazirgan Eyûbî nedizanî ku dê bimire; ji lewre wî haziriya xwe kiribû da ku here Bexdayê û li wê derê malê xwe bifiroşe.

Lê gava Xwedê, bi rehma xwe ya bêsinor gazî bazirgên lçir, piştî şînê kurê wî Ganemî biryar da, da ku li şûna bavê xwe, ew wê seferê pêk bîne, here Bexdayê. Wî ji diya xwe, ji xwişka xwe Fetnahê, ji xism û mirovên xwe û ji cîranan xatir

xwest. Paşê rabû çû bazarê, deveyên ku jê re pêwişt bûn, temîn lîcîrin; malê xwe da bar lîcîrin û tevî çend bazîrganên din berê xwe da Bexdayê. Wî xwe spart Xwedê, qedera xwe xiste destê Wî. Xwedê ew jî nebaşîyan, jî qeda û belayan parast; ew bi saxî û selametî tevî malê xwe gîhaşt Bexdayê.

Bi gîhaştina Bexdayê re wî xaniyekî bi kirê peyda kir û xanî bi tiştên giranbiha raxist û xemiland. Xaliyên xweşik û bi-
29

ha raxistin; balîf û sedîrên rind bi cih kirin; jî bo pencere û derîyan perdeyên herî baş lîcîrîn. Ganem li wê malê dima û isterehet dilcîr, bi sebir li malê ma heya ku bazîrgan û dewlemendên Bexdayê hatin ziyareta wî û bixêrhatin li wî lîcîrin. Rojekê wî biryar da, da ku here bazarê û malê xwe bifiroşe. Wî balyayeke mezin jî deh hevrişimên herî baş vekir, caw palcet kirin, bihayê cawê li ser kaxizê nivisîn; û berê xwe da bazarê, cem bazîrganên mezin. Li wê derê alîkariyeke mezin jî wî re hate kirin, şerbeta sar jî wî re anîn. Wî birin cem gîregîrê bazarê. Ew li ser piyan tavil malê Ganemî lîcîrî. Ganem bin-Eyûbî serê her dînarekî, du dînarên zêr lîcar lîcîr. Ew jî lîcarê xwe gelekî razî bû, bi wî şêweyî wî her roj çend parçe caw û hinek misk difirost.

Wî, bi wî awayî salek borand. Di desrêpêka sala duyemîn de, wek hergavî ew çû bazarê. Lê wî dît ku deriyên temamê dukanan, tevî deriyê mezin yê bazarê, girtîne. Ji ber ku ne roja tatîlê bû, ew gelekî ecêb ma. Wî sebebê wê yekê jî hinan pirsî. Jê re gotin ku bazîrganekî mezin miriye û yê din jî çûne ser gora wî. Yekî got: "Heke tu jî herî, dê jî bo te çêtir

be, tu ê fêdeya vê yekê bibînî." Ganemî got: "Belê, wisa ye, lê ez cihê goristanê nizanim, divê hin ji min re bêjin." Jê re cihê goristanê gotin. Ew bi lez çû mizgefteke nêzîk, li wê derê destmêj girt û berê xwe da cihê ku bazirgan civiyabûn. Çû tevî xelkê bû; bi hev re çûn mizgefta mezin. Li wê derê ji bo mirî nimêj kirin. Paşê cemaetê cenaze ralcir, meşîyan berê xwe dan goristana li derveyê bajêr.

Mirovên mirî -bazirgên- konelcî mezin li ser gorê velciri-bûn; ku êvarê bi lembe, find û meşaleyan dihat ronîkirin. Yê ku bi cenaze re hatibûn hemî pêlcve li bin kon bi cih bûn. Mirî li gorê danîn û ax avêtin ser, gor hate girtin. Mele û gelek kesên din ji Kîtabê terqîn xwendin û dua lçirin. Hemî bazirganan tevî mirovên mirî li bin kon, bêdeng guhdari-30

ya xwendinê kirin. Herçiqas Ganem bin-Eyûbî dixwest vegere malê jî, lê ji bo xatirê mirovên bazirgên ew jî li wê derê ma

Ber bi êvarê, ew lcarê pîroz bi dawî hat. Wê gavê kole tevî sîniyên mezin yê ku xwarin û şêrînahî li ser bû, hatin bin kon; û sînî li ber haziran danîn. Herkesî bi qasê ku li ser gorê û bi wê minasebetê lcare bixwe, xwar. Paşê mesîn û teşt anîn, wan destên xwe şûştin û ew li dora gorê rûniştin.

Diviyabû heya sibehê ew li wê derê bana; lê piştî midetekê, Ganem li malê xwe yê ku li xaniyê wî bû filcîrî û bêhuzûr bû. Ji dizan ditirsiya; filcîrî: Ez mirovekî xerîb im û wek mirovelcî gelekî dewlemend tîm naskirin. Heke heya sibeyê ez li vir bim, dê diz bikevin mala min, mal û pereyên min bi-

bin, malê paqij bikin. Di dawiyê de wisa bêhuzûr bû ku rabû ser xwe, bi hêceta ku destmêja xwe xweş bike, çû derve. Meşiya heya ku gîhaşt ber deriyê bajêr. Lê ji ber ku wext ji nîvê sevê bihurîbû, derî hatibû girtin. Çu insan li wan deran xuya nedibû. Çu deng nedihat ji bilî -ji dûr- dengê kûçik, çeqel û guran. Bi tirs Ganemî weha got: "Ji bilî Xwedê çu qudret nîne, heya niha, ez li ber malê xwe diketim, malê min di talûkeyê de bû; niha jî jiyana min." Vegeriya, dest bi lêgerîna cihekî ku Icaribe şevê lê biborîne kir. Ji wê derê ne gelecî bi dûr, wî kumbetek dît ku dora wê dîwarkirî û li kêlekê dareke mezin ya palmiye hebû. Deriyê goristanê ji granît û vekirîbû. Ganem çû hundir, xwe li erdê dirêj Icir; lê xewa wî nedihat. Bi tena serê xwe li nav goran, ditirsiya. Rabû ser xwe, derî velcir û li derve mêze Icir. Ronahiyek li dûr li ber deriyê bajêrxuya dibû. Ber bi ronahiyê meşiya; lê wî fêrç kir ku vaye ronahî jî ber bi gorê tê. Wê gavê Ganem tirsiya; vegeriya bi bayê bazdanê xwe avêt hundirê wî cihê bi kumbet û derî ji paş ve baş asê kir. Lê çî mixabin nema xewa wî dihat. Rabû çû derve, hilkişiya ser dara palmiyeyê û di nav

pelên wê de xwe veşart. Ew roniya ku dîtibû her diçû nêzîktir dibû. Li dawiyê wî dît ku vaye sê reşik in tî. Didoyan ji wan tabûtek hildabû yê sêyemîn jî fanosek û du bêr. Gava ew gîhaştin ber deriyê gorê, yê ku fanos pê re bû, ecêbmayî sekinî. Yelcî din jê pirsî: "Çi ye, Sûab?" Wî got: "Ma tu tişte-kî nabînî?" Yê din got: "Çi?" Sûabî got: "Erê Kafur, ma tu nabînî, deriyê ku we duhî velcirî hîşt vaye girtiye û ji hundir

hatiye lciîlt lciirin?" Wê gavê reşikê sêyemîn yê ku navê wî Başîta bû, got: "Hûn jî çî dîn in! Ma hûn nizanin xwediyê zeviyân yê ji bajêr, piştî gera li nav zeviyên xwe tîn vir û bêhna xwe vedidin. Û êvaran derî baş digirin û asê dilcin da ku xwe ji reşikên wek me biparêzin; ji lewre ew gelecî ji reşikên di-tirsin. Ji ber ku ew dizanin heke em wan bi dest bixin, em ê wan sor bilcin û şahî lidar bixin." Wê gavê Sûab û Kafurî ji Başîta re got: "Bi rastî jî heke di nav me de yelcî kêm aqil he-be ew jî tu yî." Lê Başîta got: "Ez dibînim ku hûn ji min bawer nalcin, lê gava em herin hundir hûn ê bibînin. Ez ji niha ve dibêjim heke kesek li hundir hebûya, bi dîtina ronahiyê re ew hilkişiyaye ser darê û xwe veşartîye. Em dikarin li wê, wî bibînin."

Bi gotinên Başîta re, Ganemê bizdiyayî yê li ser darê, fikirî: Çî reşikê hov! Ez hêvî dikim ku Xwedê ji ber xirabî û hovî-tiya wan, qira hemî sûdaniyan bîne! Xwe bi xwe got: "Ji bilî Xwedê çu qudret nîne. Ew herî mezin û qadirê her tiştî ye. Kî kare min ji vê bobelatê, talûkeyê rizgar bike?"

Wan herdu reşikên ku tabût hilgirtibû, ji yê din re gotin: "Sûab, hilkişe di ser dîwêr re bikeve hundir, derî ji hêla hundir veke. Ji ber vê tabûtê em gelecî westiyane, sto û milên me hişk bûne. Heke tu derî velcî, em soza parçeyê herî bi bez didin te, em ê wî baş sor bikin." Lê Sûabî got: "Piştî ku ez kêmaqil im; ez dibêjim ê ba |tir be heke em tabûtê bi ser dîwêr re biavêjin hundir; ji ber ku me tenê heqê hilgirtinê

32

heya gorê girtiye." Lê wan herdu reşikên din weha got: "He-

ke wek tu dibêjî, em tabûtê biavêjin, dê ji hev bikeve." Sûabî got: "Belê, heke em herin hundir, em ê rastî rêbirrê ku xwe li hundir veşartiyê bîn, yê ku xelkê dişelîne." Herduyên din gotin: "De bes bipeyîve, ma tu bi rastî jî, ji van gotinên tew-şo mewşo bawer dilcî?"

Paşê wan herduyan tabût li erdê danî, hilkişiyar, di ser dîwêr re xwe avêtin aliyê hundir; da ku derî vekin. Yê sêyemîn jî bi fanosê ji wan re ronî dikir. Wan tabût bir hundir, derî girt û ew rûniştin da ku bêhna xwe vedin. Yelcî ji wan got: "Birano, niha em gelekî westiyane; bi izna we be jî em çend saetan isterehet bikin. Paşê em dikarin cihê ku ji me re hatiyê gotin, bikolin û vê tabûtê bêî ku em zanibin lca çî têde ye veşêrin. Piştî ku me isterehet kir em ê dest bi xebatê bikin. Lê niha guh bidin min, pêşniyareke min heye. Ji bo wext bi kêfxweşî û zû bibore; em her sê reşikên xesandî -xadim-, bi dorê sebebê xesandina xwe bêjin. Em ji destpêkê heya dawiyê bêî ku em tiştêkî veşêrin, behs bikin. Bi vî awayî em dikarin şevê bi xweşî biborînin."

Di vê lehzeyê de Şehrazadê dît ku hungura sibê ye, ew bi dîqet bêdeng ma.

Lê di şeva çilemîn de wê domkir:

Ey mîrê diloan, min bihîstiyê ku gava, yekî ji wan reşikên Sûdaniyan pêşniyar kir ku ew behsa xesandina xwe bilcin, wî reşikê ku fanos pêre bû, dest pê kir û got: "Ma hûn dixwazin ez dest pê bilcim û bêjim ji bo çî ez hatim xesandin?" Yê din gotin: "Belê, lez bike bêje."

Û vaye çîrok:

Çîroka reşikê xesandî yê yekemîn ji Sûdanê

"Zanibin birano, di pênc saliya min de, bazirganê koleyan
33

ji welatê min, ez revandim û anîm Bexdayê; ez li vir firotim
memûrê serayê yê îcrayê. Qîzeke wî ya sê salî hebû. Em bi
hev re mezin bûn; û gava me bi hev re dilîst, yê li malê he-
mî kêfxweş dibûn. Ez ji bo wê direqisîm, min ji wê re stran
digotin. Hemiyar ji wî lawikê reşik yê piçûk hes dikir.

Em mezin bûn, heya ku ez bûm diwanzdeh û ew jî deh sa-
lî. Em her bi hev re bûn û me dilîst. Rojekê min dît ew tenê
ye; wek her carî ez çûm cem wê.

Her li wê rojê, wê keçikê li hemama malê xwe şûştibû;
bêhneke ter û xweş ku mirov pê sermest dibû, ji wê difuriya;
rûyê wê mîna heyva çardehê xuya dilcir. Gava wê ez dîtîm,
ber bi min beziya, hat. Me hezar cûre lîstik lîstin û dînîtî lci-
rin. Wê dev li min lci, min kirasê wê qetand; wê ez quru-
candim, min jî ew qurucand; werhasil ew tiştê li nav şeqên
min rep bû. Ê di bin cilê min de pirr eşkere xuya dibû. Wê
gavê pirqînî bi keçikê ket; wê xwe avêt ser min, ez li ser piştê
xistim erdê; û li ser zikê min rûnişt. Dest pê kir û xwe di
min de da. Dawiyê wê doxîna min velcir û ew tiştê piçûk xist
nav destê xwe; wî bi şêweyeke tesîrkar serî hilda. Keçikê ew
di navrana xwe de da; ku delîng lê bû. Wê lîstikê ez har û
dîn kirim; min ew hembêz kir û ramûsa. Wê jî ez hembêz
lci rim û ramûsa; wê xwe bi min ve zeliqand û ez ber bi xwe
kişandim û şidandim. Ez nizanim çawa çêbû, ji nişkê ve ale-
tê min î piçûk rep bû, bû mîna hesin; delingên wê qul kir,
ket nava wê û bi carekê ew ji keçaniyê xist.

Wê gavê wê keçika piçûk hîn bi heraret ez ramûsam û ez givaştim. Lê ji ber tiştê ku min kiribû, bi tirs û perîşanî min xwe ji nav destên wê rizgar Icir û ez beziyam çûm, min xwe li cem reşikekî ku min nas dikir, veşart.

Keçilca piçûk çû hundir; gava diya wê Icirasê wê yê qetiyayî û delingê wê yê qulkirî dît; ew qêriya û li nav hêtên wê mêze kir. Gava wê tiştê ku qewimîbû dît; ji ber hêrs û asabiyetê

34

pas ve qulubî û ji xwe çû. Lê belê zû şiyar bû. Belam tiştê qewimî, qewimîbû; ew piçekî salcin bû; û dest bi tiştên pêwist kir. Berî her tiştî divê bûyer ji bavê keçikê bihata veşartin.

Ew di wê meselê de bi ser ket; du meh wisa bihurîn. Her di wan du mehan de, xwediyê min cihê ku min xwe lê veşartibû dît; gelek diyarî dan min da ku ez vegerim cem wan. Gava ez vegeriyam malê jî, wan hîn jî, bûyer ji bavê keçikê re ne gotibû. Ew ditirsiyan ku heke bavê keçikê pê bihese ê min bikuje. Lê bi rastî ne diya keçikê ne jî kesên din ji malê nedixwest tişteki bi min bê; çimkî wan ji min hez dikir.

Piştî ku du meh borîn, diya keçikê soza qîza xwe da berberelcî; berberê bavê keçikê yê ku ji bo por qusandinê hertim dihat malê. Wê bi pereyên xwe ji bo qîza xwe xişil Icirîn û tiştên pêwist hazir kirin. Lê gava roja dawetê nêzîk bû, wan şand pey berberî; ew tevî alavên xwe yên berberiyê hat. Wan bi min girt; berberî gunên min girêdan(ben lê gerand). Wî bi guzên gunê min jê kir, ez xesandim. Paşê daweta keçikê çêbû, wan ez dam keçikê, ez bûm hadimê wê xanima piçûk. Ez ê êdî hertim li pêş wê bimeşiyama, çi gava ew biçûya ba-

zarê, çî jî ew biçûya mala bavê xwe. Diya wê bûyer ji kesî re negot, ne mirovên wan ne jî berber, kesek pênehesiya. O ji bo ku mêvan û mirovên wan bibînin ku qîza wê balcîre ye, wê kevokek ser jê kir û xwîna kevokê li binkirasê keçikê kir. Sibeyê herkesî binkirasê bi xwîn dît.

Ji wê rojê û pê ve, ez li cem xanima piçûk, li mala berberê mîrê wê mam. O heya ji min dihat min xizmeta xanimê dikir. Belê, gunê min jê kiribûn lê qamîşê min hebû. Ji lewre heya ku ew di jiyane de bû, min bê qeda û bela ew hembêz lîcîr û ramûsa. Lê gava wek dê û bavê xwe, ew jî mir, ez jî beşdarê nav xadimên serayê bûm. Û bi vê şeweyê ez bûm hevalê we, birano.

Niha êdî hûn dizanin ka ji bo çî ez hatim xesandin û bûm

35

xadim."

Bi wê şeweyê ew bêdeng ma. Reşikê duyemîn, Kafurî dest pêlîcîr:

Çîroka reşikê duyemîn yê ji Sûdanê

Wîgot:

"Hevalino, ev meseleya ku ez ê behs bikim, ji heşt saliya min dest pê dike. Her di wî temenê de ez ferî hunera derewgotinê bûbûm. Her sal, salê tenê carekê, min dereweke welê li hev danî ku bazirganê koleyan ji hêrs û tirsan diket erdê. Ji ber wê yekê, wî dixwest rojekê berê min bifiroşe û ji min xilas bibe. Wî ez birim bazarê, cem kolefiroş(sîmsar) û ji wî re got bi van gotinan bang bike û min bifiroşe: "Kî dîbcwaze reşikêlcî bi hemî kêmasî û xeîetiyên wî ve bilcîre?" Sîmsarî ez li

hemî bazaran gerandim da ku min bifirose. Bazirgenekî dirust hat û pirsî: 'Çi xeletiyên vî reşikê hene?' Sîmsarî got: 'Xeletiya wî ev e ku salê carekê, -tenê carekê- derewan dike.' Bazirgên pirsî: 'Baş e, ma bihayê wî çi ye?' Sîmsarî got: 'Bi tenê şeş sed drakmer.' Bazirgên got: 'Ez wî dikirim. O bîst drakmer jî bo sîmsariya te, didim te.' Şahid hatin, li ser piyan bazara xwe xilas lacin. Sîmsarî ez birim mala xwediyê min yê nuh, pereyên xwe girtin û çû.

Xwediyê min ji min re cilên nuh kirin û salekê li mala wî mam; bê ku tiştek biqewime. Werhasil sala nû hat; salê bi hêviyên xweş, têzad û têrfêkî dest pê kir. Bazirganan li bexçeyan bi dorê şahî li dar xistin. Gava dora bazirganê ku ez li mala wî bûm hat, wî bazirganê din vexwendin nav bexçeyekî li derveyî bajêr. Emir da, ku em xwarin û vexwarinê bibin wê derê. Hemî bazirgan hatin wê derê; bi kêfxweşî û zewqê ji serê sibê heya nîvro yê xwarin, vexwarin. Wê gavê

xwediyê min ferq kir ku wî tiştek li malê ji bîr laciye. Gazî min kir û got: 'Zû li hêstirê siwar be û here malê, bila xanim filan û bêvan tiştê bide te; û bîne.' Ez tavil bi rê ketim. Lê, berî ku ez bigeihê malê, ez giriyam û min dest bi qêrînê lacin, min rondik rijandin. Gelek kes ji bo meseleyê fem bilcin, li dora min civiyan. Xanima malê tevî qîzên xwe beziya hat derve, cem min û pirsî, laca ji bo çi ez welê digirîm û diqîrim. Bi girînê min got: 'Gava efendiyê min tevî bazirgan li bexçe bû, ji bo ku destmêja xwe xweş bike, çû nêzîkê dîwêr. Wê gavê dîwar hilweşiya û efendiyê min di bin xirbê

de ma. Ez bi bayê bazdanê siwarê hêstirê bûm û hatim da ku bûyerê ji we re bêjim.' Gava xanim û qîzên wê, ev tişt bihîstîtin, wan kire hawar û qêrîn; giriyan, cilên xwe qetandin, li rûyê xwe dan, hemî cîran li dora wan civiyan. Piştî mirina efendiyê malê, wek edet bû, xanimê mala xwe ser û bin lçir; mobîlye şikandin avêtin derve; derî, pencere ji hev xistin. Werhasil tiştên ku dihatin şikestin hemî parçe parçe kirin. Wê dîwar ji hêla derve dan boyax kirin û paşê bi gil û gemarê qirêj kirin. O wî gazî min kin 'Hey Kafurê bextres, li wê derê welê ebdal neseke! were vir, vê dolabê parçe bike; vê ferfurê bişikîne.' Ne pêwist bû ew lê zêde bike. Min ji dil dest pê kir; û her tişt hilweşand, parçe parçe lçir. Sandox, dolab, mobîlye û ferfurên giranbiha şikandin; min xalî, perde, caw û balîfen hêja hemî şewitandin. Paşê min dest bi hilweşandina xênî lçir. Gava min ev tişt dikirin, ez her digiriyam, min digot: 'Ax efendiyê bextreş! Ax efendiyê min ê belengaz!'

Paşê xanim û qîzên wê serpûşên xwe rakirin, porê wan li derve, çûn nav kolanê û ji min re gotin: 'Ax Kafur, de ka bide pêşiya me, me bibe cihê ku efendiyê te di bin dîwêr de ma ye. Divê em wî ji wê derê derînin û bi rêk û pêk cenazeyê wî rabikin.' Min da pêşiya wan û ez her digiriyam: 'Ax
37

efendiyê bextreş.' Rû velcîrî, por li derve; bi girîn û gazin hemiyan da dû min. Her diçû hejmara kesên ku tevî me dibûn zêde dibû. Mêr, jin, pîr, lçal, zaro û keçên ciwan. Hemiyan dikir qêrîn û warîn. Min bi kêfxweşî ew li nav bajêr geran-

din; geh ev kolan geh ew kolan. Yê n ku rastî me dihatin min bûyer ji wan re behs dikir, wan jî digot: 'Ji bilî Xwedê çu qudret nîne!'

Yelcî ji xanimê re got, baştir e, ew ewil here cem walî û bûyerê ji wî re bêje. Hemiyar berê xwe da qonaxa walî; min ji wan re got ez ê herim bexçeyê, cihê ku efendiyê min di bin xêrbê de maye.

Ez bi lez û bez meşiyam çûm cem efendiyê xwe, yê n din jî çûn cem walî. Wê gavê walî rabû ser xwe, li hespê siwar bû, tevî hin esker û karkerên bi bêr, çewal û selikan, wî berê xwe da bexçe.

Lê gava ez gîhaştim nav bexçe, min ax li serê xwe lçir; min li rûyê xwe da û got: 'Ax xanima malê! Ax keçên bextreş! Ax efendiyên min! Ez niha çî bikim! Kîjan jin dikare cihê xanima malê ya qenc, tije bike?' Gava efendiyê min ev gotin bihîstin, rengê wî zer bû; wî got: 'Xêr e, çî bi te hatiye, Kafûr? Çî bûye?' Min got: 'Ax efendî, gava ez çûm malê da ku ez wan tiştên te xwestibû, bînim; min dît vaye xanî hilweşiyaye, xanim û zaroyên wê di binê de mane.' Ew qêriya: 'Ma jina min nekarî xwe xilas bike?' Min bersîv da: 'Ax, çî mixabin na! Çu kes xilas nebûye; ya ku ewil miriye xanima malê bi xwe ye.' Wî got: 'Ma qîza min ya herî piçûk jî xilas nebûye, nikaribûye ji xênî derbikeve?' Min got: 'Ax, na!' Wî pirsî: 'Ma hêstira ku ez lê siwar dibûm jî miriye?' Min got: 'Na, efendî, xanî him ji hundir him jî ji derve, bi giştî hilweşiyaye û çu tiştêkî zindî xilas nebûye. Heya bi mî, qaz û mirîşkan jî. Her tişt di bin kevirên mezin de mane û helaq bûne.' Wî pirsî: 'Kurê min yê mezin jî?' Min got: 'Çî mixabin ew jî mi-

3»

Çu nîşaneke jiyanê xuya nedibû.'

riye.

Gava efendiyê min ev gotin bihîstin, ronahiya çavên wî te-
fiya; ber çavên wî reş bû, gêj bû û wextî biketa. Wî dest pê
lçir û cilên xwe qetandin; rîha xwe lçişand, li rûyê xwe xist;
şaşika xwe avêt. Wî li rûyê xwe da heya ku ser û çavê wî di
nav xwînê de ma. Ew qêriya: 'Ax zaroyên min! Ax jina min!
Çi bextreşî! Ma kesî belayeke welê bihîstiye?' Bazirganên din
jî li ber halê wî ketin û kelogirî bûn; hin ji wan giriyan.

Paşê efendiyê min û bazirganên din ji bexçe derketin; wî
hîn jî li rûyê xwe dida. Te digot qey serxweş e. Gava ew ji
bexçe derketin, wî dît ku li dûr toz û duxan e; dengê şîn û
girînê bilind dibe. Ew walî bû, tevî siwarên din dihat; li pey
wan jî jin, zaro û yên din yên ku tevî cemaetê bûbûn.

Ya ku efendiyê min ewil dît xanima malê bû; jina wî, tevî
zaroyên xwe dihat. Bi dîtina wan re, wî got qey ew dîn bûye;
lê paşê bi kêfxweşî hev hembêz kirin, qêriyan, giriyan: 'Ax
bavo, Xwedê te xilas lçiriye! Şukir ji Xwedê re!' O wî ji wan
re got: 'Ma hûn çawan in? Çi bi xênî hatiye?' Jina wî got:
'Şukir ji Xwedê re vaye em te sax û selamet dibînin! Ma te
xwe çawa ji bin xirbeyî xilas kir? Heçî em in, wek tu dibînî
sax û rehet in. Ê li malê tiştê nebûye; Kafur hat û ew bûye-
ra nexweş ji me re got.' Wî bi qêrîn got: 'Bûyera çî?' Wê got:
'Gava Kafur hat malê, serqot û cil qetiyayî bû û dikir qêrîn û
hawar: Ax efendiyê bextreş, ax efendiyê belengaz! Me ji wî
pirsî: Kafur çî ye, xêr e? Wî got: Efendiyê min ji bo dest-

mêjxweşkirinê çû ber dîwêr; û ji nişkê ve dîwar hilweşiya û ew di bin xirbe de ma.'

Wê gavê efendiyê min got: 'Bi Xwedê, Kafur bi bayê bazdanê hat cem min û got: Ax xanima malê! Ax zarokên wê! Min jê pirsî ka xêr e, wî got: Xanima malê miriye, ew tevî zarokên xwe di bin xirbe de mane.'

Paşê efendiyê min bi ser min ve zivirî, dît ku vaye ez axê li 39

serê xwe dilcim, cilên xwe diqetînim û şasika xwe min avêtiye. Ez çûm cem wî. Wî got: 'Hey koleyê bêar, hey reşikê lingreş, kurê dêlikê û hezar segî! Axx, tu yê herî bi lanet; te çima welê kir; te ev xem û êş li me peyda kirin?' Wê gavê min got: 'Bi Xwedê, heqê te nîne tu tişteki bêjî, li ber şahidan gava te ez lîcîrîm, te tevî xeletiya min, ez kirîm. Şahid dikarin şahidiyê bikin ku ev xeletiya min ji te re hat gotin, te pê dizanî. Ango te dizanî ku ez salê carekê derewan dikim; ji ber vê yekê ez hatim firotin û ez niha eşkere dibêjim ku ev derewa min tenê nîvderew bû; berî ku sal bi dawî bê ez ê temam bilcim.' Wê gavê efendiyê min qêriya: 'Hey bêar, reşikê bi lanet, ma ev tişt hemî nîv derew bû? Bi rastî, belayeke mezin e! Here bila çavên min te nebînin, kûçik kurê kûçikan! Here winda bibe. Ez te ji koletiyê azad dilcim.' Min got: 'Bi Xwedê, heke tu min serbest jî bihêlî, ez te serbest nahêlim; berî ku sal dawî bê, divê ez derewa xwe temam bikim. Wê gavê tu dilcarî min bibî bazarê bi pereyên ku te di xeletiya min de dabû û ez kirîbûm, min bifiroşî. Tu nilcarî welê min bavêjî derve, min çu huner nîne ku ez xwe pê xwedî bilcim.

Her tiştê ku ez dibêjim li gorî qanûnê ye; şahid hene.'

Gava em wisa sekinîbûm em dipeyîvîn; ew kesên ku ji bo rakirina cenazeyê hatibûn, hemî heyîrîn; walî û yê din gotin: Ev derew têra xwe mezin e. Tişt nema wan ji min re negot. Gotinên herî xirab dan rûyê min; lê ez keniyam, min got: ' Hûn nikarin min sûcdar bilcin ji ber ku ez tevî xeletiya xwe hatime kirîn.'

Em hatin kolana ku xaniyê efendiyê min lê bû. Wî dît ku xaniyê wî xirbe ye; û bihîst yê ku xanî hilweşandiye ez im. Jina wî got: 'Yê ku mobîlye, ferfur, guldank şikandin û xanî serûbin lçiriye, Kafur bi xwe ye.' Efendiyê malê, wê gavê yekcar hêrs bû û got: 'Min çu car yelcî weha bi lanet, kurê dêlikê nedîtiye; reşikê bêyom; û niha jî ew dibêje ev tenê nîv derew

40

Heke derew tamam baya, gelo dê çî biba? Mumlcin e ku e!

wê gavê bajarek an du bajar bi giştî bihatana lçavil kirin.' Paşê wî ez birim cem walî; li wê derê wan têra xwe li min xistin; ez bêhiş ketim erdê.

Gava ez ji xwe çûm û ketim, wan gazî berberê lçir ku tevî alavên xwe ve hat. Wî ez xesandim û paşê cihê birînê bi hesinê sor şewitand. Gava ez hatim ser hişê xwe, min dît ku ez bê gun im; ez hatime xesandin. Wê gavê efendiyê min got: 'Çawa te bi kavilkirinê tiştê min yê herî baş û rind xira kir û ez di nav xeman de hîştim; ez jî niha tiştê ku li ber dilê te herî hêja ye; xira dilcim û te di nav xeman de dihêlim.' Bi wî awayî wî ez birim bazarê û bi bihayeke bilind firotim; ji ber

ku ez hatibûm xesandin, êdî bihayê min zêde bûbû.
Ji wê rojê û vir de min karê xwe kir tevlihevî; heçî mala ku
ez lê mam, min xira kir; xwediyên xwe bê huzûr lçirin û di
nav kul û derdan de hiştin. Heya ku ez ji aliyê serayê hatim
kirîn; bûm malê mîrê mumînan. Lê êdî ez ji taqetê ketibûm;
bêgun mayîna min, gelekî ez bêhêz xistibûm.

Ev e, çîroka min û weselam."

Gava wan herdu reşikên din çîroka Kafur bihîstin; pirqînî
bi wan ket û henekên xwe bi wî lçirin: "Bi rastî jî tu de-
rewînekî tamam î; tu mîna kûpê derewan î."

Niha jî reşikê sêyemîn yê ku navê wî Basîta bû dest pê kir
û got: "Gelî pismaman; tiştê ku heya niha we bihîstiyê bi te-
nê gotin in. Ez ê niha sebebê jêkirina gunê xwe û xesandinê
ji we re bêjim da ku hûn bibîhîzin; bi rastî min muameleye-
ke girantir heq kiribû. Ji ber ku min xanima malê ramûsabû;
û min kurê malê ji rê derxistibû.

Lê detayên vê çîroka nebaş gelekî ecêb in; ji lewre wextelcî
dirêj divê. Berbang nêzîk e, dê dunya ronî bibe; berî ku roj
hilbê, divê em vê tabûtê têxin gorê, veşêrin. Ka em ewil karê
ku em ji bo wî hatine biqedînin; ez ê paşê çîroka xwe ya xe-
4i

sandinê ji we re bêjim."

Bi van gotinan re Başîta û ew herdu reşikên din rabûn ser
xwe, wan li ber ronahiya fanosê gorek li gorî tabûtê kola.
Kafur û Başîta gor dikola; Sûabî jî ax dixist sepetê û dibir di-
avêt derveyî dîwarê li dora goristanê. Wan gorek bi qasî nîv
qamekê kola. Tabût li gorê danîn, ax avêtin ser û erdê ser

gorê rast kirin. Paşê wan bêr û fanos hilda û ji goristanê derketin, derî girtin û çûn.

Ganem yê ku li ser dara palmiyeyê xwe veşartibû her tiştê ku hate gotin, bihîst. Gava yê xesandî ji ber çavan winda bûn û wî fam kir ku ew bi tenê ye, ew fikirî û wî xwe bi xwe got: Gelo di tabûtê de çi heye, kî dizane ka çi di tabûtê de ye! Lê dudilî bû, lca dakeve an na; heya berbangê li ser darê ma. Wê gavê ji darê hate xwar; dest bi kolana gorê kir; bê westan gor bi destên xwe kola, heya ku wî tabût ji gorê derxist.

Paşê, wî kevirekî birqok peyda kir û lê xebitî da ku qapaxa tabûtê rake; li dawiyê bi ser ket û qapax rakir. Wî qapax hilda, keçikeke ciwan di hundirê tabûtê de bû. Bi tiştên xemlê, mucewher û kevirên giranbiha xemilandîbû. Gerdeneke ji zêr û bi mucewheran neqîşkirî li stûyê wê bû; guhar, bazin û hwd. Werhasil hêjayê xezîneya sultanekî tiştên xemlê lê bûn. Piştî ku Ganem bin-Eyûbî têra xwe li wê rindeciwanê mêze lcir û fam lcir ku wan reşikan tiştekan pê nekirine, wî ew ji tabûtê hilda û bi dîqet li erdê vezeland. Gava keçilca ciwan hewa paqij tenefus lcir, reng hat rûyê wê; wê bihneke kûr kişand; ew pişkiya, kuxiya û wê parçeyek haşîş avêt der; ku bi wê haşîşê filek rojekê bêhiş diket. Paşê wê çavên xwe piçekî ji hev vekirin; çi çav! Di bin tesîra haşîsê de, wê nêrînên xwe birin ser Ganem bin-Eyûbî, hêdî hêdî û bi dengekî xweş got: 'Riha, tu li ku yî? Ma tu nabînî ku ez tî me! Here tijtekî vexwarinê bîne. O Zara, ma tu li ku yî? O Sahîba? Cagarat el-

4^

Dor? O tu, Nur el-Hada? O tu, Nagma? O tu, Subhîa' O berî herkesî tu, piçûlca delal Nozha, şêrîn û xweşikê, Nozha? Ma hûn hemî li ku ne, çima hûn bersîva min nadin?' Gava kesî bersîv neda; wê çavên xwe vekirin, li derûdora xwe mêze lîcir û tirsîyayî qêriya: 'Ax li min, bi serê xwe tenê, li nav van goran! Axx, kî ji seraya min, ji nav eywanên xweş xemilandî û raxistî ez anîme nav van goran? Lê xuya ye mirov nizane çî di dilê insanan de veşartîye. Tu, yê ku bi her tiştê dizane; bi sîrrên herî veşartî dizane, Tu yê tolhildar, Tu yê ku baş û xiraban di roja mehşerê, roja qiyametê de, bibînî, Tu ê wan nas bilcî."

Wê gava ku Ganem li wê derê bêî ku xwe ji cihê xwe bilivîne sekinîbû, keçika ciwan bi vê şeweyê dipeyîvî. Lê niha ew çû cem wê û peyîvî: "Ey xanima delal, sertaca xweşikbûnê; tu ya ku navê wê ji şîreya xurmeyan şêrîntir û xweştir e; nava wê ji şaxa dara palmiyeyê esnektir e; navê min Ganem bin-Eyûb e. Bêşik vir ne serayeke bi xalî û perdeyan xemilandîye; lê vir ne goristaneke bi terman tije ye jî; xulamê te vaye hazir e, ji alî Yê qadir û ezîm hatiye şandin da ku te ji hemî qeda û belayan biparêze, di xizmeta te de be; û her cihê ku tu bêjî te bibe wê derê. Mimkin e wê demê, tu ji hîmeta xwe, dilê xwe bibexşînî min." Piştî van gotinan, ew bêdeng ma.

Gava hişê wê baş hat serê wê û wê fam lîcir ku derûdora wê, tiştê ku dibîne ne xewn e, rast in; wê got: 'Ez sond dixwim ku ji bilî Xwedê çu Xwedê nîne û Mihemed resûlê Wî ye.'" Paşê wê berê xwe da Ganemî, bi çavên xwe yê geş li wî mêze kir; destê xwe da ser dilê xwe û bi dengê xwe yê nerm û

şêrîn weha got: "Ax xortê pîroz, ma tu dikarî ji min re bêjî ka kê ez anîme vir, vî cihê nenas?" Wî got: "Belê xanima delal, ez xulam, sê heb reşikên xesandî te di tabûtê de anîn vir." Wî meseleya xwe ku çawa rê şaş kiriye, hatiye wir, çawa ke-

çik ji bo ku bifetise li gorê hat veşartin; ji serî heta dawiyê ji wê re got. Paşê wî ji wê rica kir ku ew jî meseleya xwe ji wî re bêje. Lê wê got: "Ax mirovê ciwan, şukir ji Xwedê re ku Wî ez xistime destê yelcî welcî te. Lê niha ez ji te tilca dikim û dixwazim ku tu min cardin têxî tabûtê. Paşê here ser rê bisekine; hêstirekî an heywanekî din ku lcaribe vê tabûtê hilde, lcarê bike. Were min bibe mala xwe; tu ê bibînî ku çiqas fêdeya min ê bigehîje te; û ez ê te kêfxweş û bextewar bikim. Wê gavê ez ê çîroka xwe û serpehatiyên xwe ji te re bêjim." Piştî ku Ganemî ev gotin bihîstin, hema tavil rabû ser xwe; ku êdî dunya ronî bûbû û ne dijwar bû ku hêstirajoyan peyda bike; çû ser rê. Piştî çend deqîqeyan ew tevî hêstirajoyekî vegeheriya û wan tabût ku keçik têde bû, li hêstirê kir. Wan berê xwe da mala Ganemî, yê ku dilê wî bi evîna wê keçikê tije bûbû; û difikirî ku dê keçik bibe ya wî û ji ber vê fikrê serê wî gêj dibû; sermest dibû. Çi keçik, heke li bazarê wek koleyekê bê firotin, bi kêmasî bihayê deh hezar dînarên zêre; heçî micewher, kevirên giranbiha û cilên wê bi serê xwe dewlemendiyek bûn. Serê wî bi van fikran ve mijûl ew gîhastin ber malê; wan rabût hilda û bir li hundirê malê danî. Gava ew tenê man, wî qapaxa tabûtê velcir û keçik rabû ser xwe. Wê li derûdora xwe mêze kir; dît ku maleke spehî ye;

bi xalî, perde û gelek cûre rengên xweş hatibû raxistin û xemilandin ku çavên mirovî bêhna xwe vedida. Wê balyeyên mezin yên cawê hewrîşim û meşkên tije yên misk dîtin. O fam kir ku Ganem bazirganekî mezin û gelekî dewlemend e. Wê serpûşa xwe ralcir û bi şêweyeke balkêş li Ganemî mêze lcir. Wê dît ku ew gelek çeleng û xweşik e; rûyelcî wî yê zorbir heye; keçik bi evînê bi wî ve hat girêdan û got: "Ax Ganem, tu dibînî ku ez rûyê xwe ji te venaşêrim. Lê ez gelekî birçî me; ji te rica dikim da ku tu tişteki xwarinê hazir bilcî." Ganemî got: "Ser serê min, ser çavên min."

44

Çû cem Hecî Suley-

Bi lez çû bazarê, berxekî sorkirî lcirî.

manî; ku dukançiyê herî mejhûr bû li Bexdayê; sepetek çorek û tijtên welê; dendikên behîvan, fistiq, findiq û hemî cûre fêlcî lcirîn. Pajê çû çend şerbik jeraba kevin û xwej û her cûre gul û kulîlk kirîn. Hilda hemî anîn malê; gul û kulîlk xistin guldankan; û li pêş keçikê danîn. Wê gavê keçik keniya, çû cem wî, ew hembêz kir, ramûsa û hezar gotinên xwej û jêrîn ji wî re gotin. Ganemî his dikir ku evînê rehên xwe di dil û ruhê wî de her xurttir dilcir û ew bi temamî esîr dikir. Bi vê jêweyê wan dest bi xwarin û vexwarinê lcir, heya êvarê xwar û vexwar. Di wê wextê de fêrsenda herî baj bi dest ket ku ew hev baj binasin û nêzîkê hev bibin; ji hev hez bilcin, ji lewre herdu jî ciwan, hevtemen, tayê hev û xwejik bûn. Ganem rabû ser xwe lembe û find pêxistin; rûyên wan hîn zelal xuya bûn. Wî aleteki musîkê hilda, li kêleka wê rû-

nijî; piyaleyên jerabê vedagirtin; wan bi hev re vexwar; hezar lîstik û gotinên xwey û jêrîn ji hev re gotin; kenîn, stranên bi pêt û agir gotin; beytên xwey xwendin. Vî tijtî hezkirin û pevgirêdana wan li cem hev xurttir kir. Şeref û pîrozî ji bo Wî yê ku dilan dike yek û evîndaran digehîne hev!

Keçika ciwan û Ganemî jahî û dilxwejiya xwe heya hungura sibeyê domand. Wê gavê di hembêza hev de, di xewê re çûn; bêî ku bigehîjin sertaca kêfxwejiyê.

Gava Ganem ji xew rabû wî biryar da, da ku ew roj jî mîna jeva berê, divê bi kêf û jadî bibore. Bi lez çû bazarê; gojt, jînkayî, mêwe, gul û jerab kirî. Anîn malê û li pêj keçikê rêz kirin. Wan xwar heya têr bûn û vexwar heya sermest bûn. Wê gavê wî dil kir ku keçikê ramûse û bi wê re rakeve; wî got: "Ax ez xulam, izna min bide da ku ez ji lêvan te ramûsim û agirê dil û hinavê sist bikim." Wê got: "Ax Ganem, raweste heya ez serxwey bibim; da ku nizanibim ez çî dikim; wê gavê ji lêvan min ramûse, ji lewre wê gavê ez tijtekî his 45

nalcim." Tesîra jerabê hêdî hêdî li wê xuya dibû. Ew rabû ser xwe, wê cilên xwe ji xwe kirin; ji bilî serpûj ya ku bi zêr dorlêneqijkirî û binkirasekî tenik tijtek lê nema.

Gava Ganemî ew welê dît, agir û pêtî bi canê wî ket; wî got: "Ax delala min, izin bide ez ji lêvan te ramûsim!" Keçikê got: "Bi Xwedê, ez nikarim vê yekê bikim, izna te bidim, ax Ganem, li gel ku ez ji te hez dikim. Ji ber ku li dijî tijtekî ye ku li ser kembera min nivisandiyê. O ez nikarim niha nîjanê te bidim."

Welê ma. Wê keçika ciwan rê neda wî, li gel ku wê jî mîna wî ji dil dixwest. Gava tariyê erd hilçinî, Ganem rabû ser xwe, lembe û find pêxistin; eywan di bin tîrêjên ronahiyê yên lertzok de ma. Wî xwe avêt ber piyên wê, piyên wê ramûsan; tama wan mîna jîr û rûnê nivijk bû; wî serê xwe xiste nav piyên wê, hêdî hêdî ber bi jor ii nav çîpên wê, hêtên wê bir; ji bêhna lajê wê yê ku bêhna misk, gul û yasemîn jê difurî, sermest bû. Keçik mîna mirîjkeke ku baskên xwe vedide, dilerizî. Ganemî bi coj got: "Ax delalê, piçelcî ji vî koleyê evînê re insaf bike; yê ku mexlûbê çavên te û ji ber canê te ketiye erdê. Heke tu nehatiba, ez ji xwe re rehet, bêxem, bêkul û keder dijiyam." O Ganemî his dilcir ku rondikên dilxwejiyê dirijin. Wê gavê wê keçika ciwan got: "Bi Xwedê, ax efendî, roniya çavên min, ez qebûl dilcim û dibêjim; dilê min bi evîna te tije ye; ez bi canê xwe ve bi te ve girêdayî me, lê bila di bîra te de be; çu carî ez xwe teslîmî te nalcim û nahêlim tu bi min re rakevî!" Ganemî got: "Baj e, çima, asteng çi ye?" Wê got: "Ez ê îjev meseleyê ji te re bêjim; mumlcin e wê gavê tu min bibexjînî!" Bi van gotinan re wê mîna gerde nekê ew hembêz kir, ew givajt, ramûsa û hezar sozên dînane dan wî. Heya hungura sibeyê bi van lîstikan wan wext bihurand; bêî ku keçik ji wî re sebebê ku ew nikare bi wî re razê, bêje.

46

Wan mehekê welê bi wan lîstik û henekan borand, bêî ku bi hev re razên. Evîna wan her diçû di dil û ruhê wan de xurttir dibû. Lê jevekê gava Ganem li kêlelca wê veketî û

herdu jî ji ber jerabê serxwej, lê bêtetmîn bûn, wî destê xwe xist bin binkirasê wê û bi îtîna ber bi nava wê bir. Gava wî bi destê xwe ew difirikand; keçik bi temamê lajê xwe ve diricifî; wî destê xwe bir ser navika wê, ya ku mîna taseke kirîstalî xwe nîjan dida; û ew qermîçokên harmonîk û lihev mist dan; bi wê mistdanê re keçik hejiya, jiyar bû, rabû destê xwe bir ser doxîna xwe. Wê ferq lîcir ku doxîn li cihê xwe ye. Ew cardin ket xilmajê. Wê gavê Ganemî cardin nava wê firikand, destê xwe bir ser kembera wê, bi kemberê girt da ku veke û bi wî awayî deriyê kêfxwejiyê, bihujtê vebe. Wê gavê keçik careke din jiyar bû; û got: "Ax Ganem, tu dixwazî çi bikî?" Wî got: "Ez dixwazim tu bibî ya min, bi temamî, ez dixwazim ji te hez bikim û bibînim lîca tu kêfxwejiyê çawa bi min re dijî." Lê keçikê weha got: "Ax Ganem, baj e, guhdarî bike. Ez ê niha ji te re rewja xwe, sirra xwe bêjim. Mumkin e tu heq bidî min, pijtî ku tu meseleyê bibihîzî û fam bilcî ka ji bo çi ez nahêlim xortê te bi hemî hêza xwe ve, bi min re bibe yek." Ganemî got: "Guhê min li te ye." Keçikê binkirasê xwe rakir, bi kembera xwe girt û got: "Ax Ganem, efendiyê min, de ka tijtê ku li kemberê nivisandiye bixwîne!" Ganemî bi kemberê girt û ew rêzên ku bi zêr hatibûn neqijandin, xwendin: "Ez yê te me û tu jî ya min î, ey ji zuriyeta apê pêxemberî."

Gava Ganemî ew rêz xwendin, bi lez destê xwe pajve kişand. Ganem yê ku hîn sakin nebû bû, ji wê pirsî: "Ka bêje, maneya vê çi ye?" Keçikê got:

"Divê tu zanibî Ganem, ez cêriya Xelîfe Harûn el-Rejîd me; ya ku ew wek serek cêrî dizane û jê pirr hez dike. Ev rê-

zên li kembera min nîjan didin ku ez aîdê wî me û divê ta-
47

ma lêvên min û sîrrên canê min ji bo wî bîn vejartin. Navê min Kuat el-Kulub e. Ez li seraya Xelîfeyî mezin bûm; di zaroktiya xwe de, ez welê xwejik bûm ku bala Xelîfeyî kijand; wî dît ez bi hin xusûsiyet û huneran hatime xemilandin. Xwejîkbûna min wisa tesîr li wî kir ku wî bi evîneke mezin dil berda min; û li serayê ji bo min daîreyek da veqetandin û deh koleyên keçik yê xwejik xistin xizmeta min. Pajê wî ew micewher, kevirên giranbiha û tijtên xemlê yê ku gava ez di tabûtê de bûm, te dîtîn, dan min. Ji nav hemî jinên li serayê wî ez ecibandim û jina xwe, mirova xwe Zubeyda jî îhmal dilcir. Ji ber vê yekê Zubeydayê ji min nefret dilcir; û pajê wê nefreta xwe nîjan da. Gava Xelîfe ji bo serhildanekê çû jê; ji Zubeydayê re fersend çêbû; wê dest bi fen û ftltan kir. Wê hin pere dan koleyê min; ku ew berê koleya Zubeydayê bû û wê gavê wê koleyê got: "Her tijtê ku tu bêjî ez ê bikim, ji ber ku ez ji te hez dikim û sadiqê te me." Bi fikra ku ew ê xelatên spehî bi dest bixe, wê bi kêfxwejî vexwarineke ku wê hajîj tevî lçiribû da min; berî ku ez gijî vexwim, sanciyê bi min girt, piyên min ji bin min çûn, ez ketim erdê; min digot qey ez mirim. Gava wê koleyê ez wisa bêhij dîtîm, wê çû gazî Zubeydayê kir; ew hat û ez xistim tabûtê. Wê bi dizî jand pey wan her sê rejikên xesandî yê te behsa wan kir; û diyarîyên biha dan wan û got bi jê bibin tîxin gorê. Ew cihê ku Xwedê; ji bo tu min rizgar bikî, te li ser darekê danîbû; ey Ganem. Lê belê tu, roniya çavên min Ganem, yê ku ez di

mala wî ya bi rûmet de dimînim û spasdare wî me. Lê tijtê ku min diêjîne û ez pê bêhuzûr dibim; gelo gava Xelîfe vege-re û min nebîne, dê çi bike û çi bifikire. O ji ber vê yekê ye, ax Ganem, ji lewre bi kembera xwe ez hatime girêdan, ez nî-lcarim xwe teslîmê te bilcim; mêraniya te, germbûna te di na-va xwe de his bikim, wê gava ku ew bi min re bibe yek parçe. Ev e çîrolca min. O ez ji te rica dilcim da ku tu ji kese-48

kî din re nebêjî."

Gava Ganem bin-Eyûbî, meseleya ku Kwat el-Kulubê ji wî re got; bi temamî bihîst, -ango kembera li nava wê, ku keçik cêriya Xelîfeyî ya ku wî jê hez dilcir û xwediyê wê bû-, wî xwe pajve da û li quncikeke eywanê rûnişt, xwe kijand ser hev; û newêrbû li keçikê mêze bike; ji ber ku li ber çavên wî keçik bûbû yeke pîroz.

Ganem li quncikekê rûniştî, hezar lanet li xwe anîn. Ew fi-kirî; ku çiqasî nêzîlcî suçelcî mezin bûbû; û çi dînîtiyeke me-zin ku canê cêriya xelîfeyî firikandibû, givajtibû. Fam kir ku barê wî gelekî giran e. Qedera xwe ya ku ew pêrgî bela û der-dekî welê anîbû gunehbar kir. Lê wî xwe ji qudret û ezîmeta Xwedê paj neda, got: "Şeref aîdê Wî ye; bê sebeb dilê mirovî xemgîn nake; gava mirov ji hemî xirabî, nebajî û xeman bi dure.

Di vê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye; bi dîqet bêdeng ma.

Lê gava jeva pênciyemîn hat, wê got:

"Lê, wî xwe ji qudret û ezîmeta xwedê paj ve neda,

got: "Şeref aîdê Wî ye; bê sebeb dilê mirovî xemgîn nake; gava mirov ji hemî xirabî, nebajî û xeman bi dûr e."

Wê gavê keçika ciwan rabû çû cem Ganemî; ew hembêz kir, ramûsa, piyên xwe li stoyê wî mîna gerdenekê pêçan; bi her awayî, -ji bilî tijtekî- hewl da, da ku dilê wî gej bike.

Lê Ganem nema diwêriya bersîva maçên wê bide; ji lewre ew hezkira hukumdarê mumînan bû. Gava wê ew hembêz dikir û radimûsa wî deng nedikir û ew ne li hêviya tijtekî welê bû yê ku berê bi pêt û agir dijewitî. Wê maç û mistdanên xwe du qat zêde kirin da ku ew bersîva agirê dilê wê bide, lê bêfêde bû. Ganemî saetekê tamam, bê ku xwe bilivîne, borand. Gava berbanga sibeyê xwe ji nijkê ve diyar kir, di wê rewjê de, him bi agir û pêtî dijewitî him jî wî xwe ra-
49

digirt; rabû ser xwe, çû bazarê da ku xwarinê bikire. Midetelcî dirêj li bazarê ma; ji berê bêtir tijt lîcirîn; ji lewre niha sef û rêza mêvana xwe dizanî. Wî ji gulfirojan hemî gul, ji gojtfirojan berxê herî bajsorkirî, çorek û nanê herî teze; mêweyên herî teze û têrjîre kirîn. Hemî birin malê, teslîmê keçika ciwan kirin. Ew bi gavên jixweçûyî ber bi wî ve çû; bi çavên xemgîn û arzûkariyê yên jil, li wî mêze lîcir, bijirî û got: "Bi Xwedê, tu demeke dirêj ji min dûr mayî, ax delalê min, cojê dilê min! Ne saetekê, tu salekê ji min dûr mayî. Niha ez baj fam dikim ku ez nema karim xwe ragirim. Êja dilê min di ser dikeve, kela wê diçe; min dihelîne. Ax Ganem, were ez ya te me, were, an na ez ê bimirim!" Lê Ganemî bi nermî ew piçekî ji xwe paj de da û got: "Ax ez xulam, Kuat el-Kulub,

Xwedê min biparêze; ez tijtekî wisa çu caran nakim. Çawa, ma mumkin e, seg cihê jêr bigire? Tijtê ku malê efendî ye çu car nabe malê koleyî." Wî xwe ji destê wê xilas kir û çû li quncikekî eywanê, diljikestî û xemgîn rûnijt. Lê keçik çû cem wî, bi destê wî girt, ew anî ber sifreyê li kêleka xwe da rûnijtinê û ew mecbûr kir ku bi wê re bixwe û vexwe. Wê keçikê gelekî vexwar ku serê wê mest bû. Wê ew hembêz kir, ber bi xwe ve kijand; xwe bi wî ve zeliqand; kî dizane ka wê çi bi wî kir bêî ku haya wî jê çêbe. Wê ûdek hilda, ji bo wî stran gotin; wê gavê Ganem bin-Eyûb hat ser hijê xwe, bi dilekî xemgîn ji ber halê xwe giriya; gava wê dît ku ew digirî, ew jî giriya. Lê pijtî mideteke kurt wan cardin dest bi vexwarinê kir; ji bo hev beyt xwendin heya ku dunya bû tarî. Wek her jevê, Ganem rabû ser xwe, nivîn danîn lê jûna yekî wî du cihên razanê hazir kirin; ku ji hev dûr bûn. Kwat el-Kulubê bi hêrs ji wî pirsî: "Li nav nivîna din, dê kî raze?" Wî bersîv da: "Textek ji bo min yê din jî ji bo te ye. Ji vê jevê û pêve divê em bi vî awayî rakevin; tijtê ku yê efendî ye nabe yê koleyî; Kwat el-Kulub." Lê wê got: "Ax delalê min, 50

dev ji vê kevnênêrînê berde! Bihêle em ji vê daxwaz û kêfxwejiyê bêpar nemînin; îro heye sibeyê namîne. Herweha-Tijtê ku di qederê de heye nayê guhertin." Lê Ganemî nedixwest. Wê gavê ew bêtir hêrs bû; û got: "Bi Xwedê, ev jev bêî ku em bi hev re razên nebihurî." Lê wî got: "Xwedê me biparêze!" Wê dubare lîcîr: "Were Ganem, binêre ez çawa nava xwe ji te re vedikim; herareta min, daxwaza min, bangî te

dike. Ax Ganemê dilê min, were ev lêvên tije li hêviya te ne." Lê Ganemî cardin got: "Xwedê me biparêze!" Keçik qêriya: "Ax Ganem, mêze bike, çawa canê min yê ku te daxwaz dike, jil dibe; feke tazîbûna min li hêviya maçên te ye. Ganem, canê min ji yasemînekê bêtir difure; were bi min bigire, his bike çawa mest dibe!" Lê Ganemî got: "Ax Kwat el-Kulub, tijtê ku yê efendî ye nabe yê koleyî." Wê gavê keçik ji dil û hinav wisa giriya ku mirov digot qey dê dilê wê parçe parçe bibe; herçiqas Ganem jî bêsinor evîndarê wê bû, lê wî nedixwest hurmeta ku ji Xelîfeyê re dikir, bide ber pêyan. Li gel ku keçikê ji dil daxwaz jî dikir, wî bi wê jêweyê mehekê bihurand. De ka em Ganem û Kwat el-Kulubê, cêriya Xelîfeyî li wê bihêlin. Em berê xwe bidin Zubeydayê!

Gava Xelîfeyî ji bo jer sefer kir, wê rakîba xwe bi dûr xist. Berî ku mideteke dirêj bibore serê wê tevlîhev bû û weha fikirî: Ma gava Xelîfe vegere ez ê ji wî re çî bibêjim, heke ew pirsê Kwat el-Kulubê bike. Gelo dê çî bibe? Wê qerar da; ku bijeyîne pey pîrejinekê ku ji zaroktiya xwe, ew nas dilcir; û bi aqilmendiya wê bawer bû. Wê ji pîrejîne re sirra xwe got û pirsê lca divê ew çî bike. Pîrejîne goc "Ez gelekî baj fam dikim; ez xulam. Lê wext kurt e, vegera Xelîfeyî nêzîk e. Gelek awa û rê hene ku mirov dikare bûyerê ji wî vejêre; lê ez ê ya herî hêsa, pratîk û emîn bêjim. Tawil bijeyîne pey xeratakî, bila ji dar wek jiklê insanekî jiklekî çêke. Em ê wê jiklê têxin tabûtê û bibin goristanê; bi jîn û merasim divê ev tijt pêk 5i

bê. Fermanekê bijeyîne ji koleyên Kwat el-Kulubê re da ku

ew xwe ji bo jînê rej girêdin. Û berî hatina xelîfeyî bila reji-kên xesandî, serayê bi rengê rej bbcemilînin. O gava Xelîfe bê serayê û bi heyîrîn(jajbûn) bipirse ka ev çi ye, çi bûye, bila jê re bêjin: "Ax mîrê me, rehma Xwedê lê be Kuat el-Kulub miriye. Bila temenê wê ji te re be. Herweha, xanima me Zubeydayê bi qedr û qîmet cenaza wê, da rakirin ku layîqê wê û mîrê me bû: Wê emir da, da ku ew li goristanekê bi kumbet ku layîqê wê bû, ew bê vejartin." Wê gavê dê Xelîfe gelekî di bin tesîrê de bimîne û spasî te bike. Herweha ew ji bîr nake, dê bijeyîne pey kesên xwende da ku Quranê li ser gora wê bixwînin. Ji hêla din, ji ber ku Xelîfeyî dizanî ku tu ji Kuat el-Kulubê aciz bû, dê ji te jik bike û weha bifikire: Kî dizane, mumkin e, qîza xwezûrê min tijtek anîbe serê Kuat el-Kulubê û gorê bide vekirinê da ku bizane ka ji ber çi ew miriye. Lê divê tu netirsî; ji ber ku gava ew gorê velcin wê jiklê insanan di nav Icirasê herî biha de bibînin û Xelîfe dê bixwaze cara dawiyê rûyê wê bibîne; ji bîr neke tu û kesên din divê hûn bibin maniê Xelîfeyî û bibêjin: "Ey mîrê mûmînan, ne caîz e tu li vê keçilca tazî mêze bikî.! Wê gavê, dê Xelîfe bawer bike ku Kuat el-Kulub bi rastî jî miriye. Dê izinê bide ku careke din wê vejêrin û ji bo qencyên te ew ê spasî te bike. Bi vî awayî bi izna Xwedê, tu ê ji xeman rizgar bibî."

Zubeydayê got; planeke pirr baj e, gelek xelat û pere dan pîrejinê û ji wê re got, divê ew bi xwe planê pêk bîne. Pîrejinê xeratek dît; jiklê insanan pê da çêkirin; û ew jikil bir cem Zubeydayê. Wan kirasekî herî hêja ji yênan Kuat el-Kulubê li wî jiklî Icir; û bi kefenekî têrbuha pêçand. Bi merasim û jînê

cenaze rakirin; birin li goristanê li bin kumbetê vejartin; find pêxistin, li dora gorê xalî raxistin. Zubeydayê emir da, da ku seray bi rej bê pêçan û xulam û kole cilên jînê wergirin. Xe-5*

bera mirina Kwat el-Kulubê li serayê hate belav lacin; hemiyan, ji nav wan Masrûr û wan her sê rejikên xesandî jî, bi rastî jê bawer kirin.

Pijtî demekê Xelîfe ji sefera xwe ya dûr û dirêj vegeriya û hat serayê. Ew raste rast çû daîreya Kwat el-Kulubê; ji ber ku di hizra wî de, hew ew keçika ciwan hebû. Li wê derê wî xulam, kole û xanimên hevalên wê bi cilên jînê dîtin. Ew ji tirsê ricifî. Zubeyda bi xwe jî rej girêdayî, ber bi wî ve dihat. Wê gavê wî pirsî ka çî qewimî ye; jê re hate gotin ku Kwat el-Kulub miriye. Bi bihîstina vê xeberê re Xelîfe bêhij ket erdê. Gava jiyar bû, wî cihê gora wê pirsî da ku here ser gora wê. Zubeydayê got: "Divê tu zanibî, mîrê mumînan, ji ber hezkirina min bo wê, min xwest ew li seraya min bê vejartin." Xelîfe rabû ser xwe, bêhî ku cilên xwe biguhere, çû ser gora wê. Wî findên pêxistî, xaliyên raxistî li dora gorê dîtin û ji ber wê qenciya Zubeydayê wî spasî wê lacin.

Pajê xelîfe vegeriya serayê. Lê bêhî ku demeke dirêj bi ser bike ve, ji Xelîfeyî re jik û guman çê bûn. Wî emir da, da ku gor bête vekirin û cismê Kwat el-Kulubê bê derxistin. Lê bi saya dek û dolabên Zubeydayê, Xelîfeyî tenê jikê kefenpêçayî dît û bawer kir ku ew e. Wî emir da, da ku tabût bête vejartin; bi emrê wî gazî kesên xwende û îmaman lacin; gava wan Quran li ser gorê dixwend, Xelîfê jî li kêlelca gorê li ser

xaliyê rûnijtî, dilê wî dihat givajtin, wî xwe ranegirt û giriya. Meheke temam her roj Xelîfe diçû ser gorê û digiriya û herweha meleyan jî Quran dixwend. Roja dawiyê, wan ji hungura sibeyê heya roja din sibeyê xwend û dua lçir û pajê çûn malê. Xelîfe kelogirî rabû çû serayê; û wî nexwest çu kesî bibîne, heya wezîrê xwe û jina xwe Zubeydayê jî. Pijtî mide-tekê di xew re çû û ket xewa giran. Du cêrî yek li ber serê wî ya din li ber piyên wî di xizmeta wî de hazir bûn. Wî di xewa xwe de bihîst. Keçika li ber serê wî ji ya din re digot: "Çi 53

bela, xwijnca delal, Subhîa!" Subhîayê got: "Tu behsa çî dikî Nozha?" Nozhayê got: "Divê mîrê me nebihîze; ji ber ku ew diçe ser gorekê ku xeratekî jiklê insanekî ji dar çêkiriye têde vejartiyê." Subhiyayê got: "Tu çî dibêjî, xwijnca Nozha. Ma çî bi Kwat el-Kulubê hatiye? Çî bela li serê wê qewimiye?" Nozhayê got: "Koleyeke xanima me Zubeydayê her tijt ji min re got. Zubeydayê gazî wê koleyê lçir; da ku hajjê bide Kwat el-Kulubê, wê jî welê lçir. Kwat el-Kulub tavil ji xwe çû, bêhij ket erdê. Pajê Zubeydayê ew xist tabûtekê û teslîmê rejikan, Sûab, Kafur û Bajîtayê lçir û emir da, da ku bibin cihekî dûr, bilcin gorê." Wê gavê Subhîayê kelogirî weha got: "Ax Nozha, zû bêje heke delala me Kwat el-Kulub bi jêweyê ke xedar miriye!" Nozhayê got: "Xwedê ciwaniya wê ji mirinê biparêze! Min bihîst ku Zubeydayê ji wê koleyê re digot: Zahra, min bihîstiye ku Kwat el-Kulub ji gorê xilas bûye û niha li cem bazirganekî ji Şamê ku navê wî Ganem bin-Eyûb el-Motim el-Masslub e, dimîne; ev çar mehên wî ne

ku ew li wê derê ye. Herhal tu niha fam dikî ku Xelîfeyê me diçe ser gorekê ku çu kesê mirî lê nîne; ji lewre ew bûyera Kwat el-Kulubê nizane." Bi vê jêweyê wan herdu cêriyan tijt ji hev re digot û Xelîfeyî jî her tijt dibihîst.

Gava ew cêrî bêdeng man, Xelîfeyî fam kir ku tijtekî din ku bibihîze nema; ew rabû ser xwe bi hêrs qêriya; ji lewre cêriya ku wî jê hez dilcir ev çar meh bû li cem zilamekî bazirgan bi navê Ganem bin-Eyûb bû. Cêriyên reben bezîn çûn; wî gazî mirovên giregir, mîr û wezîrê xwe lcir; wezîrê wî Gafar el-Barmakî bi lez hat û li pêj Xelîfeyî çok da erdê, li ber piyên wî erd ramûsa. Xelîfeyî bi hêrs ji wî re got: "Çend esker û mihafizan hilde û here bazarê, bipirse, ka xaniyekî ku bazirganekî ji Şamê bi navê Ganem bin-Eyûb têde dimîne heye. Tu û eskerên xwe bikevin wê malê, Kwat el-Kulubê bînin û wî mirovê bêedeb jî bigrin bînin vir, wî têxin feleqe-54

yê." Gafarî got: "Ser serê min ser çavên min." Wî emir da birek mihafizan û tevî waliyê bajêr û eskerên wî, li nav bajêr geriyan heya xaniyê Ganem bin-Eyûbî dîtin.

Ganem hinekî berê ji bazarê, -ku tijtên xwarinê kirîbûn-hatibû malê; li kêleka Kwat el-Kulubê rûniştî û li ber wan berxekî sorkirî û xwarinên din rêz kirîbûn. Wan xwarin bi destan bi ijta dixwar. Gava wî qêrîn û gazîn ji derve bihîstin, rabû ser xwe çû ber pencereyê û li derve mêze lcir; û fam kir ku çi bela bi ser wan ve tê. Gafar û waliyê bajêr û eskerên wan dora xênî girtibû. Esker li dora xênî diçûn û dihatin, digeriyan. Wî, çu jik nema ku Xelîfeyî mesele bihîstiye û ji ber

bûyer û hesûdiyê ew gelecî qeheriye. Keçik ya ku rengê rûyê wê zer bûbû; ji Ganemî re got: "Ax delalê min, divê berî her tijtî tu xwe xilas bilcî. Rabe, bireve!" Wî got: "Ax delala min, roniya çavên min, ma xaniyekî ku dora wî ji alî dijminan ve girtiye, ez ê çawa jê birevim?" Wê got: "Ne tirs e!" Wê cilên wî ji wî lçirin; cubeyekî kevin û qetiyayî ku dihat ser çokên wî li wî lçir; qojxaneyek ku ji ber mayînên xwarinê têde bûn da ser serê wî, hin pijûriyên nan lê rejandin û got: "Bi vî awayî here derve; ew ê bêjin qey tu xizmetkarekî ji malê yî, kesek dest nade te. Heçî ez im, ji bo min ne tirs e; ez bi tesîra xwe ya li ser Xelîfeyî bawer im; ez ê rêyeke felatê bibînim." Ganem bêî ku ji keçikê xatir bixwaze bi ecele ji malê derket. Di nav rêzên eskeran re derbas bû, çû; kesî ew nenasî û jê jik nelçir. Lê yê ku di rojên xirab û dijwar de, mirov diparêze, her ew Xwedayê ezîm e.

Gafar ji hespê xwe peya bû û çû hundirê malê. Li nivê eywanê ku bi balya û paketên caw yê hevrîjîm li ser hev bûn; wî Kwat el-Kulub dît; wê xwe xemilandibû û ji her carê xwe-jiktir xuya dikir. Wê mucewher û tijtên xemlê yê din jî xis-tibûn lçisekî. Gava Gafar ket hundir, ew rabû çû pêjiya wî, çok da erdê; li ber piyên wî erd ramûsa û got: "Ax Gafar

55

efendî, herhal Xwedê te jandiye; ez li bendî fermana te me." Lê Gafarî got: "Bi Xwedê, ez xulam, xelîfeyî emir daye ku ez Ganem bin-Eyûbî bi dest bixim. Bêje, ka ew li ku ye?" Wê got: "Gafar, Ganem bin-Eyûbî çend roj berê piraniya tijtên xwe dan ser hev û berê xwe da jamê; çû da ku diya xwe û

xwijka xwe Fetnahê bibîne. Tijtekî din ez nizanim û tijtekî din nikarim bêjim. Heçê ev Icîs e, min tijtên xwe yên herî giranbiha xistine, divê tu lê miqatebî û bibî ji melîkê mumînan re." Gafarî got: "Baj e, ser seran ser çavan." Wî kîsik hilda û da yek ji mihafizên xwe da ku hilbigire. Pijtî ku gelekî pesnê Kwat el-kulubê da, wî ji wê rica kir ku bi wan re were serayê, cem melîkê mumînan. Pijtî ku mihafizên wezîrî, mala Ganem bin-Eyûbî talan kirin û dest dan ser malê wî, wan terka xênî kir.

Gafar çû cem Xelîfeyî; bûyer jê re got; ango Ganem çûye Şamê lê Kwat el-Kulub anîne serayê. Xelîfeyî bawer dilcir ku Ganemî tijtê ku bi keçikeke spehî tê Icirin, kiriye; ji lewre ew gelekî aciz bû; û qet nexwest çavên wî bi wê bikevin; emir da Masrûrî da ku wê li odeyeke tarî hefs bikin û pîrejinekê jî, ji bo çavdêriyê, li ba wê deynin.

Xelîfeyî siwariyên xwe ji bo ku Ganem el-Eyûbî peyda bilcin û bînin Bexdayê, jandin her deverê. O ji waliyê xwe yê Şamê, Muhamed bin-Suleyman el-Zînî re jî nameyeke weha da nivîsîn:

"Bo Sultan Muhamed bin-Suleyman el-Zînî, waliyê Şamê re; ji Melîkê mumînan Harûn el-Rajîd; xelîfeyê pêncemîn ji Benî-Abasiyan.

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan.

Ey waliyê me; divê tu zanibî ku bazirganekî xort ji bajarê te bi navê Ganem bin-Eyûb hat Bexdayê; ji harema min cêriyek xapand û tecawizî wê Icir. Ji bajarê min, ji ber tol û xezeba min reviyaye û hatiye bajarê te û li cem dê û xwijlca

xwe dimîne.

Divê tu, wî bi dest bixî, girêdî û pêncsed qamçiyên li wî bidî. Pajê tu ê wî li kolanan bidî gerandin; û divê telalekî li pêjiya deveyê bimeje û bêje: ' Yên kole, bi vî awayî tîrî terbiye lîcîrin gava ew destê xwe dirêjî malê efendiyê xwe bikin.' Pajê tu ê wî bijeyînî vir, cem min; ez ê wî bbcim feleqeyê û tijtê pêwîst dê bi wî bê kirin.

Û berdewam: Divê xaniyê wî bê talankirin û kavi lîcîrin ku kesek nizanibe ka xanî li ku bû.

Û li dawiyê: Ji ber ku dê û xwijkeke Ganem el-Eyûbî heye, divê tu wan bi dest bixî; wan bidî tazî kirin û sê rojan nîjanê xelkê bidî û pajê jî ji bajêr biqewirînî.

Fermanên min, bê kêmasî, bi cih bîne.

Wesalam!"

Qasidekî tavil hate jandin bo Şamê; ew li jûna bîst rojan, di deh rojan de bi hesp ajotîneke lez û bez, gîhajt Şamê.

Gava sultan Muhemed, nameya Xelîfeyê wergirt, wî name bir ber lêvên xwe, ramûsa, bir eniya xwe; û pajê name xwend û tavil ji bo bicihanîna fermanên Xelîfeyî hewl da, ket lîcar û xebatê. Wî emir da telalan ku li nav bajêr weha bêjin; "Yê ku dixwazin mala Ganem bin-Eyûbî talan bilcin, serbest in."

Walî tevî mihafizên xwe çû ber xaniyê Ganemî û li derî da. Xwijka Ganemî, Fetnaha ciwan lezand da ku here derî veke, wê pirsî: "Ew lîcî ye?" Walî got: "Ez im." Wê gavê wê derî vekir, pijtî ku wê walî dît; serpûja xwe bera ser rûyê xwe da û çû da ku xebera diya Ganemî pê bixe.

Di vê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye; û bi dî-
qet bêdeng ma.

Lê gava jeva pêncî û pêncemîn hat, wê got: "Wê gavê wê
57

derî velcir, pijtî ku wê walî dît; serpûja xwe bera ser rûyê xwe
da û çû da ku xebera dêya Ganemî pê bixe.

Diya Ganemî li bin kumbetekê rûnijtîbû; kumbet ku ji bo
bîranîna kurê xwe dabû çêkirin, pijtî ku salekê tamam çu xe-
ber jê nestendin, wan bawer dikir ku ew miriye; ji lewre wê
kumbetekê ji bo bîranîna kurê xwe da çêkirin. Wê nedixwar
û ne jî vedixwar, ew her digiriya. Wê ji Fetnahê re got, rê bi-
de wan xerîban bila ew werin hundir. Walî çû hundir û dît
ku vaye jinek li bin kumbetê rûnijtiye û digirî. Wî ji wê re
got: "Ez hatime ku kurê te -Ganemî- bibînim û wî bijeyî-
nim cem Xelîfeyî." Wê got: "Ax ez a bextrej, kurê min Ga-
nem, delalê dilê min, wî salekê berê ez û xwijka xwe bi tenê
hîjtin û çû; em nizanin ka çi bi gencîneya wî hatiye, çi qewi-
miye." Li gel ku walî mirovekî qenc bû jî, lê ew mecbûr bû
fermanên Xelîfeyî bi cih bîne; ji lewre mala wan talan kirin;
xalî, guldank, fêrfurî û tijtên din yê giranbiha û hêja hatin
hildan. Pajê xanî hate lçavil kirin; kevirên wî birin li derveyî
bajêr danîn. Li gel ku walî pê êjiya jî wî emir da, da ku ew
herdu, dê û xwijlca Ganemî, bên tazî kirin û sê rojan bên nî-
jan dan. O pajê jî, ew ji bajarê Şamê hatin derxistin.

Heçî Ganem bin-Eyûb el-Motîm el-Masslub bû, ew bi girîn
û bê xwarin û vexwarinê wê roja ku reviya, her mejiya. Ji
halketî, nîv mirî ew gîhajt bajarekî din; çû mizgeftekê û li

ber dîwarekî xwe bera erdê da. Li wê derê bêhij heya sibeyê welê ma; ne dilcarî xwe tev bide ne jî tijtekî bixwaze. Gava serê sibê hin mirov ji bo nimêjê hatin mizgeftê, wan ew li ber dîwêr li erdê, bêhij dît. Gava wan fam lçir ku ji ber birçîbûnê weha lê hatiye; wan ji wî re tebeqek hingiv û du nan anîn; gomlekekî kevin û qetiyayî dan wî, da ku li xwe 58

bike. Pajê wan pirsî: "Tu kî yî, tu ji ku tê(yî), xerîbo?" Ganemî çavên xwe vekirin, li dora xwe mêze lçir, lê nekarî çu gotinekê bêje, kurû giriya. Mirovên ku li dora wî civiyabûn, bîstekê li wê derê sekinîn û pajê belav bûn.

Ganem meheke tamam li mizgeftê ma. Rengê wî zer, nexwej û lawaz di nav spî û kêçan de digevizî; guneyê xelkê bi wî hat û wan biryar da, ku wî bijeyînin Bexdayê, nexwejxaneyekê; ji ber ku li nêzîk çu nexwejxane tune bûn. Ew çûn, wan ji hêjtirajoyekî re got: "Wî mirovê nexwej li hêjtira xwe siwar bike û bibe li Bexdayê li nexwejxaneyekê deyne, li wê derê, mumkin e ew rehet bibe. Pajê vegere vir em ê heqê te bidin." Hêjtirajoyî got: "Ser seran û ser çavan." Bi alikariya xelkê ku li wê derê hazir bû, xwediyê deveyê, Ganem hilda û li ser pijta deveyê danîn û baj girêdan da ku nekeve.

Li nav temasevanan -yên ku li wan mêze dikir- du jinên kincqetiyayî û feqîr hebûn ku ji hev re weha gotin: "Binêre, ev nexwejê belengaz çiqasî dijibe Ganemê me! Lê ne mumkin e ku ew ketibe vê rewjê." Jin yên ku cilên wan qetiyayî û gemar bûn, hîn nuh hatibûn wê herêmê; bi bîranîna Ganemî re dest bi girînê lçirin. Çi heyf ew jin, dê û xwijlca Ganem

bi xwe bûn; ji Şamê hatibûn derxistin û diçûn Bexdayê. Xwediyê deveyê li kerelcî siwar bû û hefsarê deveyê di destê wî de berê xwe da Bexdayê. Pijtî ku gîhajt Bexdayê li ber nexwejxaneyekê sekinî; hîn nexewjxane venebû bû, ji lewre serê sibeyê zû bû. Wî Ganem li ber deriyê nexwejxaneyê danî û vegeriya bajarê xwe.

Ganem wisa veketî li wê derê ma, heya ku bajar jiyar bû. Wê gavê wan ew dît, li dora wî civiyan û hezar texmîn hatin kirin. Her di wê demê de bazirganê herî mezin yê bazarê di wir re dibuhurî; wî ew nexwej dît û fikirî: Bi Xwedê, heke vî mirovî bibin hundirê nexwejxaneyê, ji bêxizmetî û bêderman ew ê bimire. Ez ê wî bibim mala xwe, dê Xwedê li bu-
59

hujtê min razî bike. Bazirgên emir da koleyên xwe, da ku wî nexwejî bibin mala wî; koleyên nexwej hildan û bazirgan jî bi wan re berê xwe dan malê. Gava gîhajtî malê wî gazî jina xwe kir û got: "Xanima qenc û delal, vaye Xwedê mêvanek ji me re jandiye. Baj li wî mêze bikin, lê miqatebin!" Wê çengên gomlekê xwe lê wergerandin. Di berojeke mezin de av germ kir; dest, pê û hemî lajê wî jûjt. Wê ji kincên mêrê xwe cil li wî kirin. Şerbeteke sar û xwej da wî, gulav li rûyê wî rejand. Wê gavê Ganemî êdî rehetir nefês digirt û dida; hêdî hêdî hat ser xwe, bi hêz bû; Kwat el-Kulub û serpehatiya wî hat bîra wî. Em Ganem bin-Eyûbî li wê derê bihêlin, lca binêrin çi bi serê keçikê, Kwat el-Kulubê, hat.

Heçî Kwat el-Kulub bû, ew li wê odeya tarî di bin çavdêriya pîrejinekê de, bêî ku têkiliyên wê bi kesî re çêbin hejtê rojan

ma. Li dawiyê hema bêje Xelîfeyî ew ji bîr kiribû; lê gava rojekê di ber odeya wê re dibuhurî, wî dengê keçikekê -ku bi kul û keser stran digot- bihîst. Pajê wê stran qut lçir û xwe bi xwe weha got: "Ax dostê min! Ax Ganem bin-Eyûb! Te çi ruhelcî paqij, dilekî jermoke û asîl hebû! Yê ku zilm li te dilçir te qencî pê kir; te hurmet nîjanê cêriya wî dida, wî mirovê ku dê û xwijka te ji xaniyê wan dan avêtin, û li ser te û mirovên te eyb û jermên mezin barandin. Lê rojekê, dê hûn herdu, tu û Xelîfe, hûn ê li pêj qadiyekî xwedî edalet bisekinin; wê gavê yê serketî tu û yê mexlûb dê zilimkarê te be; dê Xwedê qadî û melek jî jahid bin.

Gava Xelîfeyî ev tijt bihîstin û mesele fam kir, têgehîjt ku wî neheqî li keçikê û Ganemî lçiriye. Zû mejiya, vegeriya dîwanê û emir da serekxadimê xwe da ku here Kwat el-Kulubê bîne cem wî. Keçik hat li pêj wî, serê wê di ber wê de, çavên 60

wê tije rondik û bi dilelcî jikestî sekinî; Xelîfeyî got: "Ey Kwat el-Kulub, min bihîst te ez sûcdar dikirim; ku min bêedaletî kiriye; û te digot ku min neheqî li mirovekî lçiriye ku wî berevajî qencî bi min kiriye, min neheqî li mirovên wî yê jin kiriye." Kwat ei-Kulubê got: "Ew mirov Ganem bin-Eyûb el-Motîm el-Maslûb e. Ey xelîfê, bi navê te û qencyên te ez teyîd dilcim; Ganemî çu car tehda li min nekiriye û zor nedaye min. Xirabî û bêedebî ji wî dûr in." Wê gavê ji Xelîfeyî re çu jik û guman nema; wî got: "Çi qeda û bela, ax Kwat el-kuiub! Bi rastî jî, ji bilî Xwedayê ezîm û mezin çu zanîn û qudret li dereke din nîne. Bêje, tu çi dbcwazî, Kwat el-Ku-

lub, dê daxwaza te bi cih bê." Wê gavê Kwat el-Kulubê got: "Ey mîrê mumînan, ez Ganem bin-Eyûbê ji te rica dikim." Li gel ku Xelîfeyî ji Kwat el-Kulubê gelekî hez jî fikir wî got: "Baj e, heke Xwedê bêje erê; ez soz didim te û soza xwe çu carî pajve nagirim. Ew ê bi jan û jerefe bête xelat kirin." Wê got: "Ey mîrê mumînan, heke Ganem vegere, tu wî wek mêrê helal didî min?" Xelîfeyî bersîv da: "Belê, heke ew vegere, dê bibe yê te; tu ê bibî jina wî ya helal." Wê gavê Kwat el-Kulubê got: "Ey mîrê mumînan, kesek nizane ka Ganem li ku ye. Waliyê Şamê bi xwe ji te re gotiye, ew nizanin ka Ganem ku ve çuye. Izna min bide da ku ez li wî bigerim, heke Xwedê bêje erê, ez ê wî bibînim." Xelîfeyî got: "Ji bo dîtina wî, te izin heye ku tu her tijtê pêwist bilcî."

Gava Kwat el-Kulubê ev gotinên xelîfeyî bihîstin, ji ber kêfxwejiyê dilê wê hênik bû û bi xwe jî lê dida. Wê pijtî ku hezar dînarên zêr xistin lîcîsekî, ew bi lez û bez ji serayê derket.

Roja ewil ew ii temamê Bexdayê geriya, ji temamê bazirganînan pirsî, lê bêfêde bû.

Roja duwemîn çû bazarê cem bazirganînan, pajê çû cem gîregîrê bazirganînan; gelek pere dan wî da ku li feqîran belav bi-

61

ke; û ji wî xwest ku ew alîkariya wê bilcin.

Roja sêyemîn çû cem zêrnîgar û zîvnîgaran. Hezar dînarê din jî hildabû; gazî gîregîrê zêrnîgaran kir; ji bo ku li xerîb û feqîran bête belavkirin gelek pere dan wî jî. Gava wî gotina 'feqîrên xerîb' bihîst, weha got: "Ez xulam, min xortekî xerîb

û nexwej aniye mala xwe; lê ez ne zanim navê wî çî ye û ne jî zanim ew kî û ji ku ye. Lê an ew kurê bazirganekî mezin e, an jî ji malbeteke esilzade ye. Bi rastî pirr lawaz e, lê rûyê wî gelekî xwejik e; û xusûsiyetên wî baj in. Ev rewja wî nîjan dide ku an wî iflas kiriye û di bin deynan de maye, an bi evîneke bêçare dijewite an jî ya ku ew jê hez dike miriye." Bi van gotinan re lêdana dilê wê bilindtir bû; û wê ji wî re got: "Ey qedirbilind, heke tu nikarî bi min re werî, yelcî din bi min re bijeyîne da ku mala te nîjanê min bide." Wî gazî lawikê piçûk kir, û emir da wî da ku riya malê nîjanê Kwat el-Kulubê bide. Lawilcî da pêjî, keçik li pey ew çûn mala giregirê zêr û zîv nîgaran, cihê ku ew mirovê xerîb û nexwej lê dima.

Gava Kwat el-Kulub çû hundirê malê, wê silav da jina giregirî. Jinikê Kwat el-Kulub nas Icir; ji lewre ew hertim diçû ziyareta xanimên bi navûdeng li Bexdayê. Ew rabû ser xwe çû pêjiya Kwat el-Kulubê û erdê ber piyên wê ramûsa. Pijî bi xêrhatin û pirsên edetî; Kwat el-Kulubê ji wê pirsî: "Dayilca delal, ez hatime mala we da ku ez wî mirovê nexwej ku li cem we dimîne bibînim." Wê gavê jina giregirî, kelogirî, textelcî razanê nîjan da û got: "Vaye li wê derê veketiye. Xuya ye mirovekî qedirbilind e." Kwat el-Kulubê berê xwe da cihê ku ew mirovê nexwej lê bû. Wê li wî baj mêze Icir; ew ji hal ketî, lawaz, hestî û çerm mabû. Wê nedizanî ku ew Ganem e; lê guneyê wê bi wî xerîbî hat û kelogirî got: "Ax, ev mirovê xerîb çî nexwej û bêmirûz xuya dike; welew ku ew li welatê xwe mirovekî mezin e jî." Wê hezar dînar dan jinikê da

ku

qenc mêze bike. Wê bi destê xwe

li wî mirovê nexwej,

dermanê wî da wî, bi qasî saetekê li cem wî ma; pajê ji jînikê xatir xwest, li hêstirê siwar bû û vegeriya serayê.

Wê lêgerîna xwe ya ji bo dîtina Ganemî domand. Her roj diçû meheleyekê; heya rojekê giregirê zêrnîgar hat cem wê û got: "Ez xulam, Kwat el-Kulub, ji ber ku te ji min re gotibû ku tu dixwazî hemî kesên xerîb yên ku tên Bexdayê bibînî; vaye min du jinên xerîb anîne cem te. Yek ji wan zewicî ye ya din keçeke ciwan e. Bi bejin û bala xwe û rabûn û rûnijtina xwe ji malbateke qedirbilind xuya dilcin; lê cilên wan qetiyayî, belengaz û li pijta wan tûrê parsê heye; û hertim digirîn. Tu ya ku alîkariya fêqîran dike û dikare wan ji halê xirab û pirsên ne qenc rizgar bike; min ew anîne vir. Bi hêviya ku Xwedê ji bo qenciya te li buhujtê roja mehjerê cihelcî bide te." Kwat el-Kulubê got: "Bi Xwedê, ez dixwazim tavil wan bibînim. Ew li ku ne?" Wê gavê wî, ew ji derve ji paj derî anîn û birin cem wê.

Kwat el-Kulubê bi îtîna li Fetnaha ciwan û diya wê mêze kir; gava wê xwejikbûna wan û ew cilên wan yên peritî û gemarî dîtî, wê got: "Bi Xwedê, ji rûyê wan xuya dibe ku ev jin ne fêrbûyî kul û keseran û belengaziyê ne." Giregirê bazarê got: "Tu rast dibêjî, ez xulam. Tijtê ku xuya ye belayekê mala wan xira kiriye; û mumlcin e, zordarekî dest daye ser malê wan. Bi izna te be, em alîkariya wan bikin; da ku em ji rehma Xwedê bêpar nemînin." Gava dê û qîzê ev tijt bihîs-

tin; ew li Ganem bin-Eyûbî fikirîn û giriyan. Gava Kwat el-Kulubê dît ku ew digirîn, ew bi xwe jî giriya. Wê gavê diya Ganem bin-Eyûbî ji wê re got: "Ax, ez xulam, sultana min, înjelah bi saya Xwedê, yê ku em lê digerin em ê bibîn. Em li kurê min, delalê dilê min, Ganem bin-Eyûb el-Motim eî-Maslub digerin." Gava Kwat el-Kulubê navê Ganemî bihîst, qêriya, wê fam kir ku ew dê û xwijka wî ne; ew ji xwe çû û 63

ket erdê. Gava jiyar bû, wê ew hembêz kirin û got: "Hêviya xwe bi Xwedê û bi min ve girêdin; xwijkên hêja! Bila kul û keserên we xilas bibin, bila ev roj bibe roja we ya ewil ya bextewariyê û ya dawiyê ya xemê."

Pajê berê xwe da giregirê bazarê, hezar dînarên zêr dan wî û got: "Van herduyan bi xwe re bibe mala xwe, ji jina xwe re bêje, bila wan bibe hemamê, ji wan re cilên nuh bilcire û baj li wan mêze bike."

Roja dinê Kwat el-Kulub rabû, çû mala giregirê bazarê, da ku bibîne aya daxwaza wê hatibû cih an na. Gava ew ket hundirê malê, mazûbana malê rabû ser xwe, çû destê wê ramûsa û ji bo esaleta wê spas lçir. Pajê dê û xwijka Ganemî hatin hundir. Ew çûbûn hemamê û wan kirasên nuli li xwe kiribûn; gelekî hatibûn guhertin, spehî bûbûn. Kut el-kulubê bi qasî saetekê bi wan re sohbet lçir û pajê ji mazûbanê pirsî ka nexwejê wan yê xerîb çawa ye. Mazûbanê got: "Wek berê ye." Wê gavê Kwat el-Kulubê got: "De ka em bi hev re herin cem wî, em piçelcî dilê wî xwej bikin." Wê ew herdu jinên din yê ku li malê li qismê jinan diman û wan heya wê

gavê ew nexwey nedîtibû, bi xwe re birin hundir. Li kêleka textê wî rûnijtin; wan sohbet dikir û di nav axaftina wan de navê Kwat el-Kulubê derbas bû. Gava yê nexwey ev nav bi-hîst, reng hat rûyê wî, rûyê wî gej bû, lajê wî bi hêz bû; wî serê xwe ralcir; li dora xwe mêze kir û got: "Kwat el-Kulub, tu li ku yî?"

Gava Kwat el-Kulubê dengê wî bihîst, -ku cara ewil bû wî devê xwe vedikir û dipeyîvî- wê dengê wî naskin xwe bi ser wî ve xwar kir û got: "Ax delalê min, tu Ganem bin-Eyûb î, ne wisa?" Wî got: "Belê, ez Ganem im." Bi bihîstina van gotinan re keçika ciwan(Kulub) bêhij ket erdê. Dê û xwjlca Ganemî qêriyan û ew jî bêhij ketin erdê.

Pijtî midetekî ew jiyar bûn, hatin ser hijê xwe; giriyan û ji
64

kêfan qêriyan, Ganem ramûsan.

Li dawiyê Kwat el-kulub sakin bû û got: "Şulcir ji Xwedê re ku li dawiyê em gîhajtîn hev; ez, diya te û xwjlca te." Pajê wê mesele bi temamî ji wî re behs kir û got: "Pijtî van hemî bûyeran, Xelîfeyî ji min bawer lcir; wî te efu lcir û ez wek di-yariyekê dam te." Wê gavê gelecî kêfa Ganemî hat; wî destê Kwat el-Kulubê ramûsa; lê belê wê serê wî û çavên wî ramûsan. Pajê Kwat el-Kulubê got: "Hûn hemî li vir bisekinin, ez dê zû vegerim." Ew vegeriya serayê, dolaba ku tijtên giranbi-ha lê danîbûn anî, velcir; gelekî pere jê hilda û çû cem giregirê bazarê û ji wî re got: "Here ji bo wan jinan û Ganemî ci-iên nuh -ji her yekî re çar qat-, ji cawê herî baj bîst destmal; deh kember û deh kiras bilcire." Pajê vegeriya mala giregi-

rî, cem Ganem û yê din. Ew birin hemamê. Pajê di bin çavdêriya wê de Ganem, dê û xweha wî sê roj xwarinên baj xwarin û vexwarin vexarin. Bi dîeta sê rojan ew hatin ser xwe. Wê careke din ew birin hemamê û cilên nuh dan wan. Ew rabû çû cem Xelîfeyî; ji wî re got ku Ganem diya wî û xwijlca wî Fetnah vegeyriyane Bexdayê. Wê îhmalkarî nekir da ku ji wî re behsa xwejikbûn û rindiya Fetnahê bike. Wê gavê Xelîfeyî ji koleyekî xwe re got: "Gazî Gafarî bike!" Gafar hat û Xelîfeyî ji wî re got: "Here zû, Ganem bin-Eyûbî bîne vir!" Gafarî berê xwe da mala giregirê bazarê ku Kwat el-Kulub berî wî çûbû wir. Wê, xebera Ganemî pê xist û got: "Niha êdî dema vê yekê ye ku tu herî cem Xelîfeyî û xwejbêjî û dilpakiya xwe nîjanî wî bidî." Wê qatek cilên herî baj û biha li wî lîcin; gelek pere dan wî û got: "Divê tu pereyê xwe li serayê belesebe belav nekî, gava tu di nav rêzên xulam û xadiman re bibuhurî."

Gava Gafar siwarê hespê bi lez û bez hat ber derî; Ganern çû pêjiya wî, bixêrhatin lê kir û erdê ber piyên wî ramûsa. Niha Ganem wek berê çeleng û serbilind xuya dilcir. Wezîr

65

ew bir cem Xelîfeyî; ku li derûdora wî wezîr, walî û pêjkarên serayê û giregirên welêt rûniştîbûn. Ganem mudetekî li pêj Xelîfeyî sekinî û pajê bi dengê xwe yê xwey beytek ku bi dilê wî bû xwend.

Xeiîfê ji ber xweji, pakiya zimên û ahenga beytê gelecî ecêb ma. Ganemî tesîrek mezin li ser wî hîjt. Xelîfeyî ji wî re got pêjve were û paşê weha got: "Temamê meseleyê bê ku

tu çu tijtekî vejêrî bêje." Wê gavê Ganemî ji serî heya bi dawiyê temamê meseleyê ji Xelîfeyî re got. Lê ne hewce ye ku em li vir careke din telcrar bilcin. Qeneeta Xelîfeyî li Ganemî rûnişt ku ew bêguneh e û wî çu niyeteke xirab tune bûye; gava Xelîfeyî gotinên Ganemî yên di heqê rêzên ii kembera Kwat el-Kulubê bihîstin wî got: "Ez ji te rica dikim ku tu min ji ber neheqîya li te bûyî eftl bilcî, da ku ez wijdanen rehet bibim." Ganemî got. "Ey melîkê mumînan, ez te efil dilcim. Lê her tijtê ku aîdê kole ye, malê efendî ye."

Xelîfeyî di dema kêfxwejî û dilxwejiya xwe de, karmendiyeke bilind da Ganemî; qesreke spehî wek xelatê da wî; gelek pere û koleyên jin û mêr dan wî. Ganemî lezand çû; ku dê û xwijlca xwe û Kwat el-Kuiubê bine qesra xwe ya nuh. Pajê gava Xelîfeyî careke din bihîst ku xwijkeke Ganemî, yeke gelekî spehî û ciwan heye; wî ji Ganemî daxwaza destgirtina xwijka wî kir. Ganemî got: "Ew xulamê te ye û ez jî koie." Xelîfeyî sed hezar dînarên zêr dan wî, jand pey qadî û jahidan da ku mehra wan bête birîn. Di eynî rojê û wextê de Xelîfe û Ganem bin-Eyûb zewlcîn; Xelîfê bi Fetnahê re Ganem jî bi Kwat el-Kulubê re.

Roja din gava Xelîfe serê sibeyê ji xew jiyar bû, ew gelekî kêfxwej bû; ji lewre wî jeveke xwe jî û têzewq di hembêza Fetnaha spehî û qîz de bihurandibû. Pajê wî jand pey nivîslarê serayê da ku bi destnivîsa xwe ya spehî çîrolca Ganemî ji serî ta bi dawiyê binivîse û li arjîva dewletê bête vejartin; ga-

66
va neslên pêjedemê bbcwînin pê kêfxwej bibin.

Lê Şehrezadê berê xwe da Şahriyar û weha got: "Bawer ne-
ke ku ev çîrok ji ya Hemal û Keçikên Ciwan balkêjtir e."

Mîr Şahriyar got: "Wê gavê wê çîrokê bêje, ji lewre min ne
bihîstiye."

Û Şehrezadê dest pê lçir.

Hemal û Keçikên Ciwan

Demekê

li Bexdayê mirovelcî hemal dijiya. Rojekê gava li
bazarê, betal û li kêleka sepeta xwe ya hemaliyê selcinî-
bû, jineke ciwan ku çarjeveke ji hevrîjim û bi pelezêrkan ne-
qijandî lê bû, hat cem wî. Gava wê gojeya serpûja xwe ralçir,
cotek çavên rej, bi mijangên dirêj, xuya bûn. Ew bi bejn û
bala xwe, bi her awayî bi rêk û pêk bû. Wê bi dengekî nerm
û xwey got: "Hemal, sepeta xwe hilde û bide pey min!" He-
mal mîna ku hatibe sihêr lçirin, sekinîbû û ji çavên xwe ba-
wer nedikir; lê wî sepeta xwe hilda û da pey wê. Jinik li ber
deriyekî selcinî; li derî xist, pijtî midetekê mirovekî mumîn,
bi buhayê dînarekî zeytûn anîn, dan wê. Wê zeytûn li sepeta
hemalî danîn û got: "Bimeje!" Hemalî got: "Bi Xwedê, roje-
ke xêrê ye!" Wî sepet hilda û da pey jinika ciwan. Jinik li
cem mêwefirjokî sekinî, ji wî, sêv yên ji Sûriyeyê, sêvên os-
manî, hêjîr yên ji Omanê, yasemîn ji Helebê, zambak yên ji
Şamê, xiyar yên ji Nîlê, porteçal, hijkemêweyên aqîdekirî
yên tirj, kulîlkên heneyê, binefj, hinar û nêrgiz yên ji Misrê,
kirîn. Hemî xistin sepetê û emir da hemalî: "Hilde!" Wî se-
pet hilda û ew çûn dukana gojtfirojekî. Wê ji gojtfiroj re
got: "Pênc weqî gojt bide min!" Wî parçeyek gojt bi girani-
ya pênc weqyan jê lçir, bi pelê mûzan pêça. Wê gojt xist se-

petê û got: "Hemal, hilde!" Wî emrê wê bi cih dianî, li paj wê, ew ewil çûn cem dendikfiroj, pajê çûn dukana jêrînahiyê. Li wê derê, wê ji her cure jêrînahiyên yê ku li dulcanê hebûn, hildan: Hevîrê pasteyan yê bi bêhnên xwey û têxistiyên wî, borekên piçûk, mêweyên bi reçel. O xistin sepetê. Hemalî got: "Heke te berê bigota, min ê hêstirek bianiya ji bo birina van tijtan." Keçik keniya û mejiya, li ber dukana parfumfirojekî sekinî. Deh cûreyên avên bi bêhn, gulav, parfumê porteçalî û gelek tijtên bêhnxwejiyê, gîhayên jewatê yên duxanhijk, misk û ember, û li dawiyê çend find yên ji îskenderiyeyê Icirîn. Hemî xistin sepetê û got: "Hilde û bide pey min!" Wî, sepetê ku her diçû giran dibû, hilda; li pey jinilca ciwan mejiya heya ku ew hatin ber deriyê qesreke mezin û spehî. Deriyê qesrê ji du bejan pêkhatî, ji abanoz çêkirî û bi zêr hatibû neqijandin; li hêla hundir bexçeyekî fireh hebû. Keçikê destê xwe dirêjî zengil Icir û li derî xist; dengê xwey û melodîk ji zengil bilind bû; û herdu bejên derî ve bûn. Hemalî bala xwe bi diqet da û çavên xwe heya jê hat vekirin; û ya ku derî vekiribû dît: Keçikeke bi her awayî li hev, rûyekî mîna heyva çardehê dema nû hiltê, eniyeke wek heyvê, birû mîna heyva meha remezanê ya meha salê ya nehemin, çav wekî yên xezalan, dev mîna mora Hz. Suleyman; sînga wê ya girover ku hildibû û dadiket, mîna cotê sêvan; lê navika wê ya nerm di bin Icinan de wek naveroka nameyekê ku hatiye pêçan, vejartî bû.

Bi dîtina wê dîmenê, aqil ji serê Hemalî çû, sepet li ser serê

wî dihejiya, ew filcirî: Bi Xwedê ez di jiyanan xwe de, rojeke welê bi xêr nejiyame.

Keçika ku derî velcir, ji xwijka xwe ya ku çûbû bazarê û hemalî re got: "Fermo, injeiah dê hatina we bi xwe re kêfxwejiyê bîne!"

Ew çûn, ketin eywaneke mezin ku li bexçe mêze dikir; û
68

erdê wê bi ava zêr hatibû cîla lçirin. Eywan bi mobîlyeyên ku bi destê heqaqên herî baj hatibûn çêkirin, raxistîbû. Li nîva eywanê, textekî razanê ji mermer ku bi kevirên giranbiha yê mucewher yê ku diçurisîn hatibû neqijandin û xemilandin; û li ser text, perdeyek wek konekî ji hevrîjim, vedayîbû. Li ser textê razanê keçikeke ciwan, efsanewî bi çavên xwe yê babilî, bi bejneke zirav mîna herfa elîf û rûyekî geş ku rojê jê jerm dilcir, veketîbû.

Ew rabû ser xwe, çend gav ber bi xwijkên xwe ve avêtin û gor. "Çima hûn li wê derê welê hantal sekinîne? Sepetê ji ser serê hemalî deynin!" Ya ku çûbû bazarê li pêj, ya derî vekir li paj û bi alîkariya xwijka sêyemîn, wan hemal ji barê giran xilas kir û sepet danî erdê. Pajê, wan sepet vala kir, hertijt li cihê pêwist danîn; du dînar dan hemalî û gotin: "Bizîvire û bi riya xwe de here, hemal!" Lê hemalî li wan mêze dikir, ji xwejikbûna wan ecêbmayî difikirî ku tijtekî welê qet nedîtîye. Wî ferq kir ku çu zîlam li malê tunebûn; li hemî mejrûbatan, mêweyan, gulan û tijtên din yê xweş, mêze kir û pirr ecêb ma. Çu niyeta wî û çûyîne tunebû.

Wê gavê xwijka mezin got: "Çi bi te hatiye, tu qet nalivî?"

Ma tu dibêjî heqê te hindik e?" Wê berê xwe da xwijka xwe ya ku çûbû bazarê û got: "Dînarekî din jî bide wî." Lê hema-lî got: "Xanimên spehî û qenc, bi Xwedê, ez bi du nîv-dîna-ran razî dibim. Ez ji heqê xwe razîme. Lê dilê min, ruhê min bi hebûna we tije bûye. Ez ji xwe dipirsim, gelo bê zilam, ye-kî ku bi we re yar be, hûn çawa dijîn. Wek tê zanînê minare-yek bi serê xwe tenê ne pirr spehî ye, heke ew yek ji çar mi-nareyên mizgeftê nebe. Hûn her sê tenê ne, xanimên delal; yek jê kême e. Hûn dizanin bê mêr, jinek bi serê xwe bexte-war nabe. O wek jaîr dibêje: Akordek bê çar aletên musîkê nabe temam û harmonîk; debriqeyek, ûdek, gîtarek û bilû-rek. Ji ber vê yekê, xanimên delal, kêmasiyeke we heye; hûn

69

sisê ne, instrûmenta çaran, ango divê bilûr bibe mêrekî zane û hêja; hunermendekî ku Icaribe sirran vejêre."

Wan keçên ciwan got: "Erê, hemal, ma tu fam nalcî ku em bakîre ne? Ji lewre em ditirsin xwe bispêrin mirovekî tewte-we; û me jaîr xwendiyê yê ku dibêje: "Sirra xwe vejêrin, sirra ku ejkere bûye êdî ne sirr e."

Pijtî van gotinan, hema-lî got: "Xanimên delal, ez bi serê we sond dixwim ku ez mirovekî bi aqil im; û min gelek pir-tûk xwendine, hûn divê ji min bewer bikin. Ez tenê behsa tijtên qenc dikim yê neqenc û xemgîn ji xwe re, di dilê xwe de, dihêlim."

Gava xwijkan ev tijt bihîstin, piçekî nerm bûn û ji bo pey-vê, gotin: "Hemal, divê tu zanibî, me gelek pere ji bo vê qes-rê mesref Içiriye. O tu yê ku dixwaze li ber sifreya me rûne; û

heya hungura sibê ku roj rûyê me ronî bike, textê razanê bi me re parve bike; ma tu dikarî mesrefa vê qesrê bidî? Ji ber ku bêî mesrefê em te dawet nalcin.." Xwijka mezin lê zêde kir û got: "Evîneke bê pere ne giranbiha ye." xwijlca dergevan got: "Eger tijtekî te nîne, tu çawa destvala hatî welê jî here." Lê keçika ku çûbû bazarê got: "Ax, xwijkên delal, piçekî bêdeng bin! Bi xwedê vî zilamî roja me xirabtir nekiriye. Yelcî din ba, bi me re ewqas sebir nedilcir. Ez, mesrefa ku dê li wî biçe digirim ser xwe."

Vî tijtî hemal gelekî kêfxwej lcir û wî got: "Bi Xwedê, ez ji te re gelekî spas dikim û deyndarê te me." Her sê xwijkan got: "Hemalê jîrek, li cem me bimîne, bêjik em te wek mirovekî qenc dizanin." Keçika herî ciwan rabû ser xwe kûzê jerabê velcir, jerab sefand, li dora hawizê avê cihê rûnijtinê çêkir û her tijtê pêwist raxist û danî. Wê jerab bera piyalan da û hemal li nav wan, ew her sê rûnijtin. Wî hîn jî digot qey, ev xewn e, xeyal e.

Wan carekê, ducar, sêcar qedehên xwe vala kirin. Hemalî
70

çend qesîde xwendin, destên keçikên ciwan ramûsa; keçikan dest bi reqsê lcirin û bi gulan re leyîstin. Hemalî ew ber bi xwe dikijandin û ew radimûsan, keçikekê çend gotin bi henekî dan rûyê wî, ya duyemîn xwe spane wî, ya sêyemîn bi gulan li wî da. Wan bi vî awayî vexwar heya ku aqil ji serê wan dûr ket. Gava desthilat bi tamamî ket destê jerabê, keçika dergevan rabû ser xwe, lcincên xwe hemî ji xwe kirin; û çîp oryan xwe avêt nav hêwiz; bîstekê avjenî lcir, av xiste de-

vê xwe û avêt hemalî. Wê xwe jûjt, av li nav hêtên xwe re-
jand. Li dawiyê ji avê derket, li ser çokên hemalî rûniyt, nav
hêtên xwe, navrana xwe, nîjan da û ji hemalî pirsî:

"Delalo, tu zanî navê vî çi ye?" Hemal keniya û got: "Xelk
dibêjin, ew xaniyê rehmê ye." Wê dengê xwe bilind kir û
got: "Bê edeb!" û li wî xist. Wî bi qêrîn : "Na, na, navê wî
qûn e" "û hinek tijtên din." Bi van gotinan re wê bi hijkî li
wî da, welê ku çermê canê wî rabû; hemal qêriya: "Baj e, bi
ya te navê wî çi ye?" Wê bersîv da: "Gullêva min." Wî got:
"Xwedê bi gullêva te re be."

Pajê qedehên jerabê cardin geriyan. Niha keçika duyemîn
cilên xwe ji xwe kirin; û xwe avêt nav hêwiz, wê jî wek xwij-
lca xwe lcir û li dawiyê hat li ser çokên hemalî rûniyt. Wê jî
nav hêtên xwe nîjan da û pirsî: "Roniya çavên min, navê vî
çi ye?" Wî got: "Qula te ye." Wê bi qêrîn got: "Çi bêedebî,
gotineke welê xirab, di devê mêrelcî de." Wê çend jîmaqên
baj li wî dan. Wî got: "Ew gullêva te ye." Wê li pijta stoyê
wî da û got: "Na, na!" Wî got: "Baj e, tu bêje?" Wê got:
"Kunciya min ya qejartî."

Niha jî keçika sêyemîn rabû ser xwe, cilên xwe danîn û ke-
te avê. Wê jî wek xwijkên xwe kir. Ji avê derket, cilên xwe ji
xwe kirin û hat li ser çokên hemalî rûniyt û ew cihê nazik nî-
jan da û got: "Texmîn bike, ka navê vî çi ye?" Wî dest pê lcir
vir de wê de, bû pil pila wî; berî ku keçik dest bi lêdanê bike,
7i

wî got: "De ka tu bêje!" Wê got: "Cihê jevnivîna Abû Man-
sur.

Wê gavê hemal rabû ser xwe, cilên xwe ji xwe kirin, çû ket avê. Pijî ku wî jî wek keçikan xwe jûjt, ji avê derket, xwe avête hembêza keçika dergevan û piyên xwe danîn ser çokên keçika herî temen piçûk. Wî jî aletê xwe nîjan da û ji mazûbanê pirsî: "Ez xulam, navê vî çi ye?" Bi bihîstina van gotinan re pirqînî bi her sê keçikan ket; ji ber kenînê dihejiyan... û bi dengekî bilind, gotin: "Tijê te." Wî got: "Na!" û yek li dû yekê wî dev li sînga wan kir, wê gavê gotin: "Aletê te." Wî got: "Na, na." û qurmîçek avêtin sîngên wan. "Belê, ew aletê te ye, germ bûye û bê sekin hildavê." Lê hemalî ew radimûsan, qûrmîçek diavêt wan, ew hembêz dikirin, ji ber kenînê keçikan dikir ji ser xwe herin. Di dawiyê de wan got: "Ma bi ya te navê wî çi ye?" Hemal midetekê fikirî, li nav hêtên xwe, li aletê xwe mêze lçir, çav lê jikand û got: "Xanimên delal, niha ez ê ji we re bêjim ka vî xortî, ji min re, çi got: Ez im, yê bihêz ku gullêva jêrîn vedikim, silavekê li kunciya qejartî dikim û bi nihênî dikevim nav nivîna Abû Mansur."

Bi van gotinan re ew her sê xwijk welê kenîn ku li erdê digevizîn. Heya êvarê vexwarin. Wê gavê wan ji hemalî re got: "Niha berê xwe bizivirîne da ku em nav milên te yê fireh bibînin û ji vir here." Hemalî got: "Bi Xwedê ji ruhê min re hêsantir re ku terka lajê min bide, jûna ku ez terka we, terlavê malê bikim, xanimên delal. Bi izna we bila ev roja bidawîhatî, bi jevê re yek be, sibeyê em her yek bi riya xwe de herin; ka di qedera me de çi heye." Wê gavê keçika ku çûbû bazarê ji xwijkên xwe re got: "Xwijkên delal, ma çi dibe heke em bihêlin, ew îjev li vir be? Welê xuya dike ku ew zila-

mekî yarîker, bêjerm û tijî kêf û zewq e; bi hevaltiya wî me her kêf lçiriye." Wan ji hemalî re got: "Baj e, tu dikarî îjev li 72

vir bimînî; lê jertekî me heye, yê ku biryarê dide em in; û divê tu, sebebê çu tijtekî nepirsî; yê ku tu bibînî." Wî got: "Belê, ez xulam." Wan got: "De ka here tijtên ku li ser derî nivîsandîne, bixwîne!"

Di wê lehzeyê de Şehrezadê dît ku êdî hungura sibê ye; bi diqet bê deng ma.

Gava jeva jêst û pêncemîn hat, Dunyazadê got: "xwijka delal, çîrokê tamam bêje!" Şehrezadê got: "Bi kêfxwejî û diljahî mîna ku wezîfeyeke min be." Wê domand:

"Keçikan ji hemalî re got: "Here tijtê ku li ser derî nivîsandiye, bixwîne.!"

Ew rabû çû, wî lçaxiza li ser derî ku bi xetên zêrîn lê hatibû nivîsîn xwend: "Tijtê ku te eleqedar nake pirs neke, bi vî awayî tu dikarî xwe ji bihîstina tijtên nebaj û bixem biparê-

A»

Zl.
Wê gavê hemalî got: "Ez xulam, ez we jahidên xwe qebûl dikim û soz didim, tijtê ku min eleqedar neke, ez napirsim."

Pijtî ku hemalî soz da, xwijka piçûk sifreya xwarinê raxist, xwarin danî; wan bi hev re bi kêfxwejî û bi mad xwarin xwar. Pajê lampe pê xistin, gulav rejandin, giyayên bêhnxwey jewitandin, dest bi vexwarin û xwarina ew hemî tijtên ku ji bazarê kirîbûn, lçirin; bi taybetî hemalî her wê gavê qesîdeyên(beytên) melodîk digotin û pê re çavgirtî serê xwe di-

hejand. Lê ji nijkê ve dengê lêdana derî hat wan, lê wî dengî, jahiya wan qut nelcir. Di dawiyê de, dergevana ciwan rabû ser xwe ku biçê, binêre ka lcî ye li derî dixê. Ew vegeriya û wê got: "Tijtê ku xuya dike, dê avahî îjev tije bibe. Li ber derî sê mirovên xerîb sekinîne, her sê jî rû kurkirî ne û ji çavê xwe yê çepê mehrûm in. Bi rastî tesadufek nedîtiye! Min tavil tê derxist û fam lîcir ku ew xerîb in; bêjik ew ji welatê Rûmê ne. Ew qet najibin hev; lê ecêb kenê mirov bi wan tê, heke em bihêlin ew bîn hundir, em ê têra xwe bi wan yariyan bilcin."

73

Wê bi vî awayî xwest xwijkên xwe razî bike; li dawiyê wan got: "Baj e, rê bide wan bila werin, lê bi jertê ku tijtên ku eleqeya wan pê tune, divê nepirsin da ku gotinên nexwej nebihîzin." Keçika ciwan bi kêfxwejî beziya çû ber derî û pajê bi wan her sê yek çavan re vegeriya. Rûyê wan bi rastî jî kur-lîcirî lê simbilên wan ber bi jor badayî bûn; ji rewja wan welê xuya bû ku ew ji terîqeta parsekanfkalenderan) ya Farisan bûn. Wan silav da yê hazir û serên xwe tewandin; lê li piyan piçelcî dûr sekinîn. Heya ku keçên ciwan ew dawetî rûnijtinê kirin. Wan li hemalî yê ku serxwej bûbû, mêze kir; gîhajtî wê qeneetê ku ew jî ji terîqeta wan e. Wan got: "Vaye parsekekî din jî li vir e!" "Em kêfxwej bûn." Hemalî serê xwe rakir, çavên wî doj bûn; û got: "Dev ji min berdî, herin li wê kaxiza ser derî binêrin." Pîrçînî bi keçikan ket û ji hev re gotin: "Niha em ê têra xwe henekan bi van parsekan û hemalî bikin." Keçikan ew dawetî sifreyê kirin. Kalenderan bi ijta xwar û vexwar. Wê gavê hemalî got: "Gelî biran,

ma di tûrê we de çu çîrok an mesele nînin ku hûn ji bo me bêjin, da ku em pê kêfxwej bibin?" Pijtî van gotinan heyacanê bi wan kalenderan girt û tika kirin ku heke hebe ji wan re aletekî musîkê bînin. Dergevan çû defikeke bi zengil ji Mûsilê û ûdeke ji Iraqê û bilûreke farisî bîne. Her sê parsek rabûn ser xwe, yekî defik hilda, yê din ûd û yê sêyemîn rahijte bilûrê û dest bi lêxistinê kirin. Keçikan stran digot, hemal jî ji guhdariya dengên mukemel û musîlca xwe jixweçûyî hil dibû.

Pijtî midetekê bi bihurîna vê kêf û zewqê, cardin dengê lêdana derî bihîstin; dergevan rabû çû binêre, ka kî ye li derî dixe.

Û niha bibihîze lca lca ye li derî dixe!

74

Her di wê jevê de Xelîfe Harûn el-Rejîd, ji bo bi çavên xwe bibîne û guhên xwe bibihîze ka li bajarê wî çî diqewime, tevî wezîrê xwe Gafar el-Barmakî û celadê xwe Mansûr yê ku bi fermana xelîfeyî serî difirandin, xwe bera nav bajêr dabû. Ew, yek caran bi vî awayî bi cilên bazirganan li nav bajêr digeriyan.

Her di wê demê de, gava ew di ber xaniyê ku dengê musîkê û stranên jê dihat dibuhurîn, Xelîfeyî daxwaza xwe ejkere kir, ango wî dixwest ew biçin hundir û bibînin lca ew kî ne stranên dibêjin. Lê Gafarî îtîraz kir: "Bêjik, komek serxwejin, divê em xwe ji tijtên nexwej biparêzin." Xelîfeyî got: "Na, îlam em ê herin wir, de ka tu ji bo em herin hundir û wan jaj bihêlin, rêyekê bibîne." Pijtî vî emrî, Gafarî got:

"Ser seran û ser çavan;" û çû li derî xist.

Gava dergavana ciwan derî vekir, Gafarî got: "Ey xanima delal, em bazirgan û ji Tîberîas in; tevî malê xwe em hatine Bexdayê. Ev deh roj in, em li vir in û em li meheleya bazirgan dimînin. Em îjev mêvanê bazirganekî bûn, jeva me xwe j û dewlemend bû; lê jevbêrka me zû xilas bû. Gava em ji wê derê rabûn û derketin da ku em biçin taxa xwe, em xerîb in, tarî ye, me riya xwe winda kir. O niha, em ji we tika dikin da ku hûn, îjev me wek mêvanan, bihewînin. Xwedê qenciyan ji bîr nake, dê xelatan ji we re bibexşîne."

Dergevanê bi diqet li wan mêze kir, wê qeneet anî ku ew bazirgan in; û pirr muhterem xuya dikirin. Ew çû bi xwijkên xwe jêwirî û wan biryar da, ku wan vexwînin malê. Keçik rabûn ser xwe û bi van gotinan silav li wan kirin: "Hûn bi xêr hatin, injelah hûn ê ji me razî bimînin, gelî mêvanan! Lê jertekî me heye, ango divê tijtên ku we eleqedar nakin, hûn nepirsin da ku hûn pêrgî xirabiyên neyên." Wan bersîv da: "Baj e, me qebûl e." Pajê ew rûnijtin; qedehên vexwarinê hatin dagirtin, mey hate gerandin. Xelîfeyî li wan kalenderan

75

mêze lçir û ferq lçir ku her sê jî bê çavê xwe yê çep in; û ew gelekî ecêb ma; lê zerafet û xwejikbûna wan her sê keçikan ew mit û mat hêla. Keçikan jerab pêjkêjî wî kir; lê wî bi gotinên weha red kir: "Na, ez li ser riya hecê me, ez diçim Mekeyê." Wê gavê dergevanê maseyeke xwe j neqijandî li ber wî hazir lçir û li ser maseyê fincaneke ji ferfura Çînî danî; û fincan, bi ava teze ya gulan û jekir; ku bi hinek berfê hatibû sar

Icirin, tije Icir. Wê ew fîncan dirêjî wî kir; wî ji dil spas kir û filcirî: "Sibeyê, ji bo vê qencî û xizmeta wê, divê ez hin diyarîyan bidim wê."

Keçikan, ji ber qedirgirtina mêvanan, tijtên vexwarinê her dianîn. Lê gava jerabê tesîra xwe nîjan da, mazûbanê bi destê xwijka xwe ya piçûk girt û jê re got: "Tu hazir î?" Xxwijkê bersîv da: "Belê, ez hazir im." Wê gavê dergevan rabû ser xwe û ji kalenderan re got, herin li ber derî bisekinin. Wê tijtên ku li erdê raxistîbûn dan alî; û eywan paqij kir. Wan herdu keçên din, ji hemalî re got: "Ji hevaltiya te tijtek xuya nake; goya tu ne xerîb î, tu ji malê yî." Wê gavê hemal rabû ser xwe, cilên xwe rast kirin, kembera xwe jidand û got: "Ez di emrê we de me." Bi îjareta keçilca herî ciwan, hemalî da pey wê, ew çûn derve cihê ku du dêlik girêdayî bûn. Gava wî ew herdu dilêk anîn eywanê, mazûban çû pêjiya wan û wê benê li stoyê dêlikekê ji destê hemalî girt û bi qamçiyê li serê dilêkê da. Dêlik bi nûze nûzê her digiriya, lê keçikê her li wê dixist, heya ku ew westiya. Wê gavê, mazûbanê qamçî ji destê xwe avêt, dêlik hembêz kir û rondikên wê zuwa Icirin û serê wê ramûsa. Pajê ji hemalî re got: "Ya din bîne!" Hemalî ya din anî, wê her eynî tijt bi wê jî kir.

Dilê Xelîfeyî, bi wan pirr jewitî û xemgîn bû; çav da wezîrê xwe Gafarî da ku ew ji keçikê sebebê van tijtan bipirse. Lê Gafarî bi îjaretan got, ya çêtir ew e ku em bêdeng bimînin. Di dawiyê de mazûbanê berê xwe da xwijkên xwe û got:

76

"De Ica em niha jî, karê xwe yê hercarî pêk bînin!" Wan ber-

sîv da: "Ser seran û ser çavan!" Wê gavê mazûban hilkijiya ser textê razanê yê ji mermer û bi zêr û zîv neqijandî û got: "Niha jî, de ka marîfetên xwe nîjan bidin." Dergevan hillcijiya ser textê razanê, cem mazûbanê, xwijka piçûk ûdek dirêjî wê kir. Wê dest bi gotina straneke li ser evîn û xemên evîniyê lçir; wê welê bi tesîr û ji dil digot ku wê kincên xwe peritandin û bêhij ket erdê.

Gava li erdê, nîvtazî û herweha pijta wê zelût veketîbû, xelîfeyî li pijta wê cihên kamçiyên dît û geiekî ecêb ma. Lê xwijka piçûk av anî, li rûyê keçika jixweçûyî rejand, jê re kirasekî nuh anî û ji bo lixwekirinê alikariya wê lçir.

Wê gavê Xelîfeyî ji Gafarî re got: 'Tu, jêweyeke pirr tuhaf sakin î; ma te cihê qamçiyên li lajê wê keçikê ne dîtî? Ez nema karim xwe ragirim, divê ez zanibim ka maneya van tijtan çî ye? O li pêj her tijtî, rewja wan herdu kûçikan.'" Gafarî bersîv da: "Xelîfeyê min, bila jertê ku me qebûl kiribû bê bîra te, heke em naxwazin pêrgî xirabiyên bîn, divê em tijtelçî nepirsîn, ango yên ku me eleqedar nakin."

Her di wê gavê de, keçilca herî piçûk rabû ser xwe, ûd hilda, li ser sînga xwe ya girover danî; tiliyên xwe li ser ûdê gerandin û straneke evînî ya xemgîniyê got. Wê gavê mazûbanê lçirasê xwe qetand, ew jî wek xwijka navîn jixweçûyî ket erdê. Stranbêj çû cem wê, ji bo wê ji bêhijiyê jiyar bike av li wê rejand û kirasekî nuh ji wê re anî. Mazûban li ser textê razanê rûnişt û got: "Ji bo em karibin deynê xwe bidin, ma tu nikarî straneke din jî bêjî?" xwijlca herî piçûk careke din akorda ûdê têtûz kir û stranên xemê û evînê; û herweha yên kêt û zewqê gotin; bi vê yekê re cara duyemîn keçilca derge-

van bêhij ket erdê; pê re jî cihê qamçiyên di lajê wê de caf-din diyar bûn.

Bi wê, rewj û bûyerê re wan her sê kalenderan ji hev re go-
77

tin: "Dê gelekî çêtir bana heke em nehatana vir, welew ku li derve, li bin asîmanê sayî jî, em razana; ji ber êja vê menzereyê mirov nikare tehamul bike." Xelîfeyî berê xwe da wan û pirsî: "Çima?" Wan got: "Ji ber ku tijtên em li vir dibînin gelecî tesîrê li me dîkin, me diêjînin." Xelîfeyî got: "Ma hûn ne ji malê ne?" Wan bersîv da: "Nexêr, na. Em dibêjin qey, mirovê li kêleka te rûnijtî, xwediyê malê ye." Lê wê gavê he-malî nema xwe ragirt û got: "Bi Xwedê, ev cara yekemîn e, ez li vir im; xwezî li jûna vir ez li derve li ser komek kevîran veketîbama."

Wan mêvanan li hev kir ku ji keçikan îzahetekê bixwazin, heke pêwîst be wan mecbûrê vê yekê bilcin. Tenê Gafar li dij vê yekê sekinî û got: "Ma durîst e, rast e, em welê bilcin? We çî zû ji bîr kir ku em mêvanên wan in; û me jertê wan qebûl lîcîriye, ji lewre divê em bi ya keçikan bikin û li ser soza xwe bimînin. Vaye dunya wê ronî be, berbang nêzîk e, sibeyê em her yek, em ê di rîya xwe de herin, ka di qedera me de çî he-ye." Wî çav da xelîfeyî û cuda ji wî re got: "Tenê saetekê ma-ye, ez soz didim te ez ê sibeyê wan ji te re bînim serayê, da ku em karibin îzaha meseleyê ji wan bixwazin." Lê xelîfeyî red lîcîr û got: "Min sebir nemaye; ez nikarim heta sibeyê ra-westim." Mêvanan munaqejeya xwe domand û careke din zivîrîn ser pîrsa, ka dê lîcî daxwaza wan bi cih bîne, ango ji

keçikan bipirse. Bi ya hinan ji wan ev wazîfeya hemalî bû. Pijtî midetekê keçikan pirsî: "Mirovên qenc, hûn li ser çi dipeyîvin?" Wê gavê hemal rabû ser xwe, li pêj mazûbanê sekinî û got: "Ez xulam, bi navê Xwedê ji te rica dilcim; û li ser navê hemî mêvanan daxwaz dilcim da ku tu bûyera wan herdu kûçikan, ango te çima bi qamçiyên li wan xist, pajê tu giriyayî û te ew ramûsan; de lca ji me re bêje, da ku em têbigihin, ma çima li lajê xwijka te jûna qamçiyên lêdayî hene?" Keçikê berê xwe da mêvanên din û pirsî: "Ma rast e, hemal 78

li ser navê we jî dipeyîve?" Hemiyan ji bilî Gafarî got, "rast e." Gava keçikê bersîva wan bihîst weha got: "Gelî mêvanan, bi Xwedê ev xebera herî nexêrê bû ku min bihîst. Me berê jertê xwe ji we re gotibû, tijtê ku bi we neketiye ne pirsin û nexwejiyan peyda nelcin. Ma we nedikarî hûn ji halê xwe razîbin, me xwarin, vexwarin û cih da we. Lê xeletî ne ji we ye; ji xwijka me ye, ji lewre wê rê da we da ku hûn werin hundir, cem me, mala me."

Bi van gotinan re wê çengên gomlekê xwe iê wergerandin; sê caran piyên xwe ii erdê dan û qêriya: "Hoo, tavil werin vir!" Wê gavê deriyê dolabeke kincan vebû; heft heb rejikên wek zebaniyan, di destê wan de jûrên tûj, hatin der. Wê emir da: "Piyên van gevezeyan girêbidin; û pajê jî benê wan hemiyan bi hev ve girêdin!" Rejikan welê kir û pajê pirsî: "Ey, hukumdara me, tu, kulîlka ku ji nêrînên mêran dûr di-jî, em serê wan bifirînin?" Wê got: "Na, bîstekê rawestin; di-vê ewil ez ji wan bipirsim, ka ew kî ne."

Wê gavê hemalî got: "Bi Xwedê, ez xulam, yê din sûcdar in, min çu xeletî nekir; min nekuje. Bifikire, bi Xwedê heke ev kalenderên lingrej nehatana, me yê çî kêf bilcira. Ev kalenderên weha lingrej bi hebûn û hazirbûna xwe dikarin bajarelcî lçavil bilcin."

Bi van gotinan re keçîk kenîya, ber bi zilaman çû û got: "Her tijtî bêjin; ji lewre li jîyanê tenê saetek wextê we heye. Ji hêla din tehamula min ji ber feqîriya we ye, heke hûn ji ejîr an jî ji hukûmetê, ji yê xwedî qudret bana, niha zûde min serê we dabû jêkirin."

Wê gavê Xelîfeyî ji Gafarî re got: "Ax li halê me, tu niha mecbûrî ji wê re bêjî, ka em kî ne, an na dê me bikujin." Lê

»t--v l __a

ج

_« r

a | _

a

"v

|a_v_a

»xt:U

~i.

—

1

(jarari bersiv ua: ui neqe mc uc yt. yveiiteyî got: JNîna çu fêdeya henekan nîne; henek jî cidiyet jî wextê wan heye."

Keçîkê berê xwe da kalenderan û pirsî: "Ma hûn birayê

79

hev in?" Wan got: "Na, bi Xwedê em di nav hejaran de yê herî hejar in; em bi hunera, zelû danîn û rakirinê dijîn." Wê ji wan yek bi yekî, bi taybetî pirsî: "Ma tu ji diya xwe yek çavî çêbûyî?" Yê yekemîn bersîv da: "Bi Xwedê, na, meseleya korbûna çavê min dirêj e; û yekta ye, heke hin hebin û bini-vîsin, tije jîret û ders in." Kalenderên duyemîn û sêyemîn jî wekî yekemîn bersîv dan. Pajê wan got: "Em ji welatên cuda tîn. Serpêhatî û macerayên me cuda û yekta ne." Wê gavê keçikê got: "Baj e, madem weha ye, ka behsa serpêhatiyên xwe bilcin; û bêjin ka hûn çima hatin vir. Pajê destên xwe bibin ser serê xwe, ji me re spas bilcin û bi riya xwe de herin. Hûn û qedera we."

Yê yekemîn ku pêjte hat hemal bû; wî got: "Ez xulam. Ez tenê hemal im; ne çu tijtekî din." Xwijlca te li bazarê da pêjiya min û ez anîm vir. Tijtê ku li vir hatiye serê min û qewimiye hûn pê dizanin û herweha hûn dizanin ji bo çî ez naxwazim behs bikim. Meseleya min hemî ev e; û min çu gotineke din jî nîne ku lê zêde bilcim."

Keçikê got: "Baj e, rabe ser xwe, spasî me bike û bi riya xwe de here!" Lê hemalî got: "Na, bi Xwedê, heya ez guhdariya yê din, ka ew çî dibêjin, nekim, ez ji vir naçim."

Wê gavê kalenderê yekemîn ber bi pêj ve hat û dest pê kir.
Çîroka Parsekê Yekemîn

"Ez ê bo we, sebebê rûkurkirin û ji çavê xwe bûyîna min çî ye, behs bikim.

Bizane ku bavê min li bajarekî û birayê wî jî li bajarekî din mîr bûn. Roja ku ez ji dêya xwe çêbûm, her di wê rojê de, pismamekî min hat dunyayê.

Dem çû, sal û roj borîn; ez û pismamê min, em mezin
80

bûn. Ji çend salan carekê ez diçûm cem pismamê xwe û bi mehan li wê derê dimam. Cara dawiyê gava ez çûm cem pismamê xwe, wî pirr bi dilxweji û comerdî bixêrhatinî ii min icir; mêjin da serjêkirin û gelek jerab hate çêkirin... Me dest bi vexwarinê lîcir; me vexwar heya ku ji alî jerabî ve em zorbirî bûn. Wê gavê pismamê min got: 'Ax pismam, ez ji herkesî pirrtir ji te hez dilcim, ez ê tikayeke mezin ji te bikim; ez naxwazim tu bêjî na, an jî tu ji min re bibî asteng.' Ji bo xatirê dostaniyê min soz da wî ku ez ê alîkariya wî bikim; lê wî ez dam ber sondên mezin; min bi Quranê sond xwar, bi wî awayî ew razî bû. Gava min daxwaza wî bi cih anî; rabû çû derve û pijtî midetekê tevî jineke ku cilên giranbiha lê û bi mucewheran xemilandî bû, vegeriya. Wî got: 'Vê jinê bi xwe re bibe û herin filan û bêvan cihî, li ber filan gorê li hêviya min rawestin.' Pijtî sondê êdî min nedikarî ez red bilcim, ji lewre ez û keçik -em- çûn. Li goristanê, me xwe da bin kumbetekî û em li benda pismamê min sekinîn. Pijtî demekê ew hat, pê re bêrek, tûrek kils û mesînek av jî hebû. Wî ji ser gorê kevir rakirin, ax da alî heya qapaxek di jiklê deriyekî piçûk de, xuya bû. Wî qapax hilanî, derenceyek xuya dikir; wî îjaret da jinekê. Ew tavil rabû ser xwe, di derenceyê re daket û ji ber çavan winda bû. Wî berê xwe da min û got: 'Pismam, gava ez di derenceyê re daketim jêr, vê qapaxê wek berê bide ser, axê bavê ser û keviran mîna berê deyne. Pajê avê li kilsê bike û tevvide, kilsê welê baj li nav keviran bide ku bi

hev ve bizeliqin da ku kesek bîr nebe ku kils nuh e lê kevir kevnin; û bi vî jêweyî pê bihesin ku gor vebûye. Herweha divê tu zanibî, pismam, ev salek e ku ez welê pê mijûl im; ji bilî Xwedê çu keselcî nizane.' O lê zêde lçir: 'Ez hêvî dilcim tu ji min nexeyîdî û aciz nebî, ji ber xatir xwestina bi vî awayî, Xwedê alîkarê te be!' Pajê daket jêr û winda bû. Min çkapax danî ser û wek wî gotibû kir, gorê mîna halê xwe yê berê xu-81

ya dilcir.

Ez vegeyiam seraya apê xwe, ji ber ku apê min tevî siwar û peyayan çûbû nêçîrê, ez çûm odeya xwe ya razanê. Sibeyê min dest pê kir û ez li ser bûyera ku di navbera min û pisma-
mê min de borî bû, fikirîm; ez pojman bûbûm. Lê pojmani-
yê fêde nedikir. Ez rabûm ser xwe, çûm goristanê da ku wê gorê bibînim. Heya êvarê ez bêsebeb lê geriyam, neçar ez ve-
geriyam serayê. Min ne dikarî bixwim û neji vexwim; pisma-
mê min hergav di hizra min de bû. Roja din û hefteyên din her ez li gorê geriyam, lê bêfêde bû; di dawiyê de ez welê bê-
huzûr, xemgîn û aciz bûm ku ez ditirsiyam ku ez dîn bibim. Ji bo ku piçekî ji kul û derdan bi dûr kevim, ez vegeyiam bajarê bavê xwe. Bi gîhîjtina min ya li ber deriyê bajêr ve birrek mirovan êrij anî ser min û destên min girê dan. Ji vê yekê ez gelekî aciz bûm, ez kurê Mîr, ew xelk hemî xulamên bavê min, herweha xulamên min jî. Min bi tirs meraq dikir; gelo çî bi bavê min hatiye, min ji wan yên ku min girê da-
bûn pirsî; lê wan bersîv neda. Pijtî midetekê koleyekî min î xort got: 'Qedera bavê te nebaj bû; eskeran bi wî re îxanet

Icir; û wezîrî bavê te da kujtinê.'

Pajê ez birim, ji ber mirina bavê xwe ez wisa xemgîn bûm ku min nedizanî ka ez dijîm an na. Wan ez birim avêtim pêj wezîrî, yê ku bavê min kujtibû. Ji ber sebebê ku ez bêjim, di navbera min û wezîrî de dijminahiyeye kevin hebû. Min ji tîrkevan û tîr avêtinê gelecî hez dikir. Rojekê teyrekî mezin li ser kumbeta seraya wezîrî danîbû û wezîr jî ii wê derê bû. Min tîrkevanê xwe hilda, ji bo ku ez tîrekê biavêjim teyrî, min kevan, jidand, tîr ji kevanî derket û çû rastî çavê wezîrî hat û çavê wî kor bû; qeder û daxwaza Xwedê, wê carê wezîrî ji ber ku ez kurê mîr bûm deng nekir. Lê vê carê gava destên min gêrêdayî li pêj çavê wî bûm, wî emir da; ku serê min jê bikin. Min ji wî pirsî: "Bêî ku min sêcek kiribe, ma tu difi-
82

kirî min bidî kujtin?" Wî çavê xwe yê ku tîr lê ketibû û kor bûbû, nîjan da û got: "Ma ji vî mezintir sêc heye?" Min got: "Min bi zanebûn welê nekir, çu qesta min nebû." Wî got: "Heke te bêqest jî Iciribe, ez li jûna wî bi qest welê dikim." Wî destê xwe dirêjî min kir; tiliya xwe di çavê min yê çepê re Icir û bi tamamî çavê min tehrîp kir. Pijî wê bûyerê, hew çavekî min heye.

Pajê bi fermana wezîrî, wan ez xistim sepeteke mezin û wezîrî ji celad re got: "Berpirsiyarê wî tu yî. Şûrê xwe ji kalên bikijîne, wî bibe derveyî bajêr serê wî bifirîne, bila heywanên dirinde lajê wî bixwin."

Celadî ez birim derveyî bajêr, berî ku min bikuje, wî dest û piyên min girêdan û haziriya çav girêdanê dikir. Wê gavê

ez giriyam û min ji bêhêvî beytek xwend. Gava celadî beyt bihîst, hat bîra wî û fikirî ku li cem bavê min celad bû; û min gelek qencî bi wî lçiribû. Wî got: "Ma ez ê çawa karibim te bikujim? Ez koleyekî te î sadîq im. Bazde ji vir here; û çu çaran venegere van herêman, ji lewre dê te jî, min jî, biku-
»

Ez vegeyriyam bajarê apê xwe, herçiqas ez ji çavekî bûm jî, ji ber ku ez ji kujtinê xilas bûbûm min jikur dikir û ez hebe- kî teselî dibûm. Gava min bûyerên çêbûyî ji apê xwe re gotin, ew gelecî jaj bû, welê giriya ku ji xwe çû. Pajê gava jiyar bû, wî got: 'Ez ji ber mirina kurê xwe pirr xemgîn im; û niha jî bi bihîstina van tijtên hatine serê te û bavê te, kul û der- dên min her zêde bûn. Herçiqas tu ji çavekî xwe bûyî jî, lê jikur tu dijî.'

Bi van gotinên wî re êdî min nelcarî ez xwe ragirim; tijtên ku bi lawê wî hatibû min jê re gotin. Apê min gelecî kêfxwej bû; û got: 'Wê gorê tavil nîjanê min bide!' Min got: 'Apo, bi Xwedê, ez cihê wê nizanim. Ez gelecî lê geriyam lê min nedî.'

83

Werhasil ez û apê xwe, em rabûn çûn goristanê; vê carê min baj bala xwe da yê û ez iê geriyam û min cihê gorê dît. Apê min pirr kêfxwej bû, em çûn bin kumbetê me ax da alî û qapax hilanî û em ji derenceyê daketin jê; pêncî pê bû. Di dawiya derenceyê de em rastî duxanekê hatin, ji ber duxanê me nedikarî pêjiya xwe bibînin. Apê min duayek ku mirovî ji tirsê rizgar dike, lçir. 'Ji bilî Xwedê yê mezin û xwedî qud-

ret, çu hêz an qudreteke din nîne.'

Em mejîyan çûn hundirê odeyekê ku tije arvan, hemû cûre zad û tijtên xwarinê û hwd li wê bû. Li nîva odeyê textekî razanê ku dora wî perdekirîbû, hebû. Mamê min perde dan alî, dît ku kurê wî û ew jinika ku pêre daketibû gorê li ser textî veketîne û herdu jî mîna ku di nav agir de bijewitin, licizirîne.

Bi dîtina wê menzereyê ve apê min tif li rûyê kurê xwe kir û qêriya: 'Di heqê te de ye xebîs! Li vir tu bi êjên bin erdê ezab dikijînî, lê êj û ezaba wê dunyayê li benda te ne; û diwartir in.' Apê min jimikek ji piyê xwe hilda û bi wê li rûyê kurê xwe da."

Bi van gotinan re Şehrezadê dît ku êdî hungura sibê ye û bi îtîna bêdeng ma...

Lê hatina jeva heftêyemîn wê got:

Mîrê delal, tê gotin ku gava parsekî meseleya xwe ji keça ciwan re digot, wan kesên din, Xelîfe û Gafarî jî guhdarî dicir:

"Bi dîtina wê rewjê, ango dema apê min bi jimikê li rûyê kurê xwe dida ez sersem bûm û ez gelekî li ber pismamê xwe û keçika li kêleka wî veketî, diketim. Min nema xwe ragirt:

'Mamo, bi Xwedê, ya baj ew e, em ji vir herin! Dilê min gelcî bi kurê te û vê keçilca ciwan dijewite; û bi ser de jî tu bi jimikê li rûyê wî didî.' Wê gavê mamê min weha got:

'Erê birazî, divê tu zanibî ku vî kurê min, ji piçûktiya xwe

84

ve bi dilekî têr û tije bûbû evîndarê xwîjlca xwe. Min ew ji

hev dûr xistin û min got, hîn xejîm in, xort in, de xem nake. Lê çi mixabin bi kamilbûna xwe re ew bûyera xirab qewimî. Hatî ji min re gotin, min ne dixwest ez bawer bilcim, lê min his dikir û min ji lawê xwe re got: 'Xwe ji sûc û xirabi-yên weha biparêze, jê dûr be, an na tu yê eybê bi ser xwe de bînî û bikevî devê herkesî. Vaye ez ji te re dibêjim, gunehên welê neke, heke tu bikî ez ê ewil te lanet bikim û pajê jî bikujim.' Ji bo ku ew ji hev dûr bin, min gelekî hewl da; lê Şeytên jî karê xwe dikir; herweha sebeb hene ku mirov bawer bike, ango vê jinika xirab jî, ji kurê min gelekî hez dikir. Gava kurê min dît ku ez wî ji xwijka wî, dûr dihêlim, ji hev diqetînim; ihtimala mezin wî ev cihê bin erdê peyda lîcîr û gava ez ji bajêr bi dûr diketim, diçûm nêçîrê, ew dihatin vir. Lê tijtê xuya dike, wê gavê, Xwedayê mezin, ew tavil jê-witandin, lîcîrin komir. Lê ezabên mezin û xirabtir li dunyaya din in.'

Bi van gotinan re mamê min, nema xwe girt û giriya; min jî bi wî re rondik rijandin. Wî ji min re got: 'Ji vir û pê ve li jûna wî tu ê bibî lawê min.'

Gava em vejeriyan bajêr, gelemjeyeke mezin li dar bû. Li her derê dengên defên jêr û herbê bilind dibûn; esker vir de wir de dibezîyan; ji ber simên hespan toz û tofan radibû. Mamê min pirsî lîca çi qewimiye; hinan bersîv dan, gotin: 'Wezîrê ku birayê te kujtibû, niha tevî eskerên xwe ve hatiye û dixwaze dest deyne ser bajarê me, gava bajariyan dît ku berxwedan fêde nake; dest hil nedan.'

Min fam kir ku heke ez bikevim destê wezîrî, dê min bikuje, mîna ku bavê min kujtibû, ji bo ez neyê nasîn min

rûyê xwe kur lçir; hin cilên din li xwe kirin û min koçê vî bajarê Bexdayê lçir; bi hêviya ku ez rastî hinan bêm ku riya serayê nîjanî min bidin; ez herim cem Melîkê mumînan, haki-
85

mê dunyayê Harûn el-Rejîdî; û meseleya xwe jê re bêjim. Vê êvarê ez hatim bajêr û min nedizanî ka ez bi ku de herim. Wê gavê ez rastî vî kalenderî hatim; gava em sekinîbûn û me bi dostanî bi hev re qise dikir, kalenderê din jî hat û silav da me û got: 'Ez li vî bajarê xerîb im.' Me got: 'Em jî xerîb in.' Em li nav bajêr geriyan heya tariyê bi ser erdê de girt; qedera baj em anîn vir, cem we xaniman.

Ev e, îzaha yekçavbûn û rûkurkirina min."

Gava kalenderî gotina xwe xilas kir, keçika mazûban ya ciwan got:

"Baj e! Xatir bixwaze û bi riya xwe de here!" Lê wî bersîv da: "Ez xulam, ez naxwazim herim, berî ku ez meseleya hevalên xwe bibîhîzim."

Yên din hemî rûniştî û ji tijtên ku bihîstin ecêb man. Xelîfeyî ji Gafarî re got: "Di jiyana xwe de min tijtekî welê ecêb nebihîstiye."

Gava parsekê yekemîn rabû ser xwe û çû cihelcî piçekî dûr mîrankî rûnişt; yê duwemîn hat li pêj keçilca mazûban çok da erdê, erd ramûsa û dest bi gotinê lçir:

Çîroka Parsekê Duyemîn

"Ez xulam, ez bi xwe ji diya xwe yekçavî nehatime dunyayê. Meseleya ku ez ê niha bêjim welê ecêb e ku heke hin binivîsin, bêjik dê gelekî tecrûbe û ders, jê bîn wergirtin.

Ez mîr kurê mîr im û ne mirovekî nezan im: Min Quran û heft çîrokên wê, pirtûkên gir yên zanayên mezin xwendine; min ilmê stêrkan xwendiyê; min gotinên jaîran xwendine. Bi kurtî: Min wisa bi zanabûn û daxwaz ilim xwendiyê ku ez bi rehetî dikarim bêjim, ez ji hevdemên xwe xwendetir im.

86

Ji lewre, li nav xwende û mîran nav û dengê min hebû; juhreta min li gelek welatan belav bûbû. Di dawiyê de navûdengê min gîhajte Mîrê Hindistanê. Wî qasidekî xwe tevî gelek xelatan jand cem bavê min û tika kir ku ez herim cem wî. Bavê min got 'erê'; û jej kejtî tije mal dan hazir kirin. Em bi kejtîyê mehekê tamam çûn û gîhajtî rejahiyê. Ji wan deveyên ku me bi xwe re biribûn, deh ji wan bi xelatan ji bo Mîrê Hindistanê, barkirîbûn. Em bi rê ketin. Pijtî midetekê li pêj me duxaneke tîr rabû û ji me re bû asteng; ango me pêjiya xwe nedidît. Gava duxan ji hev belav bû, jêst siwarên wek jêran li pêj me xuya bûn. Wê gavê me fam lîcir ku ew rêbirrên ereb in; ku li kêlelca rîyan xwe vedijêrin; em revîyan. Bi dîtina wan deh deveyan re ku ji bo Mîrê Hindistanê bi xelatan barkirî bûn, wan serê hespê xwe berdan û dan dû me. Me îjaret da wan û gor. 'Em qasid in, em diçin cem mîrê Hindistanê, xirabiyekê bi me nelcin.' Lê wan bersîv da: 'Em ne li welatê wî ne û me hewce bi wî nîne.' Pajê, wan çend heb ji xulamên me kujtin, yên din û tevî min, em her yek bi hêlekê ve revîyan. Ez bi xwe jî birîndar bûm. Lê erêban neda pey me, ji ber ku ew bi xenîmetê biliyabûn.

Min, ne dizanî ez li ku derê me, ne jî dizanî ka ez çî bikim.
Ax, hinek berê ez di nav hebûn û serbilindiyê de bûm û niha
jî bêkes û feqîr bûm. Ez raviyam heya ez gîhajtîm serê girekî
bilind; li wê derê di jikeftekê de min bêhna xwe veda û jev
borand.

Roja sibeyê min ajot, ez gîhajtîm bajarekî mezin, bajar di
bin siya demsaleke xwey de bû; ku çu tesîra zivistanê lê nexu-
yabû û biharê her tijt bi kulîlkên xwe yê renga reng xemi-
landibû. Bi çûyina xwe, ya wê derê, ez kêfxwey bûm; ji lewre
pijtî siwarîbûyîna demeke dirêj ez gelekî westiyabûm. Ez bi
temamî hatibûm guhertin; bêjik gej bûn û rengê rûyê min
çûbû, rûyê min zer bû bû.

87

Min ne dizanî ka ez bi ku de herim; lê gava ez di ber terzî-
xaneyekê re diborîm; ku terzî rûniştî û cil didurûtin; ez selci-
nîm, min silav da wî. Bi dilgermî wî bixêrhatin li min kir; ci-
hê rûniştinê nîjanî min da, got 'fermo rûnîke.' Pajê sebebê
ewqas dûrhatina min ji welêt, sebebê hatin û karê min pirsî.
Min tijtê ku qewimîbû ji serî heya dawiyê jê re got. Ew gele-
lcî li ber min ket û got: 'Dostê hêja, divê tu ji çu kesî re behsa
xwe nekî, her kî be jî. Ji lewre ez, ji Mîrê vî bajarî ji bo jiyana
te endîje dilcim. Ew dijminekî kevin yê bavê te ye, di navbe-
ra wan de meseleyeke nehelkirî, heye.'

Pajê wî xwarin, vexwarin îkram lçir; me xwar, vexwar; heya
êvarê em peyîvîn. Êvarê wî ji min re cihê razanê li terzîxane-
yê çêlcir. Pijî ku ez sê rojan li cem wî mam, wî ji min pirsî,
Ica di destê min de çu huner heye ku ez karibim pê nanê xwe

derxim. Min got ku belê ez mirovekî xwende; û xwedî hezar fen im, gelek ilman(zanistan) û bi taybetî hiqûqê dizanim; dikarim bixwînim û hesab bikim. Lê wî got: 'Dostê qenc, ev ne huner in.' Wê gavê mirûzê min daket, wî lê zêde lcar: 'Bi kêmasî, çu mijterî ji bo wan hunerên te, li vî bajarî nîne. Li vir çu kes naxwîne, kesek ne lcare bixwîne û ne jî binivîse û ne jî hesab bike; lê bi vî an wî awayî herkes lcarekî dike û pê nanê xwe derdixe.' Hêviya min bi temamî jikest û min her dubare lcin 'Bi Xwedê, ji bilî ev hunerên min gotin tijtekî din ji destê min nayê.' Wî got: 'Madem welê ye, xortê qenc, bivirekî û werîsekî hilde, kincên xwe biguhere; here ji çolê êzingan bîne; heya ku Xwedê dergehekî bajtir veke. Lê, bila ji bîra te neçe, behsa xwe ji çu kesî re neke; an na dê te bikujin'

Bi wî awayî, wî bivirek û werîsek dan min, ez jandim cem kesên din yên ku êzing hûr dikirin, li cem wan bû kefilê min û ez dam nasîn. Min dest bi hûrkirina êzingan kir; min gurzêk êzing hildidan dianî li bajêr bi nîv dînarî difiro. Min bi 88

qismek ji wan pereyan xwarin dilcirî yên din jî bi îtîna vedijart. Bi wî awayî min salekê lcar kir; û ez her roj diçûm terzî-xaneyê dostê xwe, ez li quncikekî, mîrankî rûdinijtîm û min bêhna xwe vedikir.

Rojekê gava ez çûm çolê da ku êzingan bînim, ez çûm nav daristaneke gurr. Li wê derê gelek darên hijk ji bo êzingan hebûn; min dareke hijk hîlbijart, min ax ji dora qurmê darê da alî. Ji nijkê ve bivirê min, di çengilekî ji paxir de, asê bû;

gava min baj bala xwe da yê, min dît ku çengil bi darqapaxe-
kê ve ye. Min qapax rakir, derenceyek xuya bû: Ez di deren-
ceyê re daketim heya ez gîhajtî ber deriyekî. Bi vekirina
derî re, min xwe li eywaneke muhtejem ku eywana kojkeke
spehî bû, dît. Li wê derê keçikek rûniştî û mîna mircaneke
herî zelal diçurisî; bi rastî welê xwejik bû ku hemî derd û ku-
lên min bi carekê ji bîra min çûn û tune bûn. Min nedikarî
ez nêrînên xwe ji wê bi dûr bixim. Ez bi jêweyeke mutewazî
li Avakarê wê keçika bêqusûr difikirîm.

Gava wê ez dîtîm, wê ji min pirsî: 'Tu insan î, an cin î?'
Min got, ez insan im. 'Kê berê te da vî mekanî, ev bîst sal in
ku çavên min bi çu mexlûqan neketine?' Pijîti ku wê ev peyv
bi awayekî pirr nerm, jêrîn û xwej gotin; min got: 'Ez xu-
lam, Xwedê ez jandime vir, da ku ez derd û kulên xwe, xe-
mên xwe ji bîr bikim.' Pajê ji serî heya dawiyê min ji wê re
her tijtê ku qewimî bû gotin. Xuya bû ku ew gelecî li ber
min diket, dilê wê bi min jewitî, giriya û got: 'Ez ê meseleya
xwe ji te re bêjim.' Wê got:

'Divê tu zanibî ku ez qîza Aknamûs Mîrê herî dawî yê
Hindistanê û hukumdara Ebenholtson im. Bavê min, ez
dam kurê xwezûrê min, lê belê di jeva daweta min de, berî
ku ez ji keçaniyê bikevim, efrîtekî ez revandim ku navê wî
Corcîros e; kurê Racmûs ku kurê îblîs bi xwe ye. Wî anî ez li
vir danîm; jêrînahî, xwarin, vexwarin û herçî tijtên min ji wî
89

xwestin peyda kirin; caw û cilên biha û ev tijtên xemlê û ra-
xistinê anîn. Ji deh rojan carekê tê cem min, jevêkê ii vir di-

mîne û berî ku dunya ronî be, winda dibe, diçe. Wî ji min re gotiye ku heke min di nav van rojan de pêwistiyek bi wî hebe, tijtê divê ez bilcim, tenê ev e ku ez destê xwe bidim ser wan herdu rêzên nivîsî ku di bin qubeyê de xuya dikin. Û rast e, wê gavê ew tê. Ew çar roj berê li vir bû; jej roj mane ku ew vegere, tu dilcarî pênc rojan li vir bimînî.'

Min got, baj e, ez ê li cem te bimînim; ew gelecî kêfxwej bû, bi destê min girt, ez birim hemamekê xwe jî têrgerm. Min tavil cilên xwe danîn, wê jî hemî cilên xwe jî xwe kirin. Pijtî hemamê em li kêleka hev rûnijtin; wê jêbet û kulînce anîn; me him sohbet dikir him jî tijtên ku efrîtî anîbûn dixwar û vedixwar. Dawiyê wê got: 'Divê tu îjev pirr rehet û xwe jî razê û bêhna xwe berdî; ji lewre pijtî wan zehmetiyan, lazim e tu baj bi ser xwe ve bêhî.'

Gava ez jiyar bûm, ew li kêleka min rûnijtî pê û lingên min difirikand, min xwe pirr baj his dikir. Min duayên herî qenc ji bo wê kirin, bi qasî saetekê em peyîvîn; pajê wê ev gotinên delal gotin: 'Gava û heya, ez di vê kojka binerd de bi tenê bim ez ê hertim xemgîn û azar bim; ev bîst sal in ez welê me, ji ber ku çu kesek nîne ez pê re bixivim; lê jukir ji Xwedê re vaye Wî tu jand vir.'

Min destê xwe da ser sînga xwe û spasî wê kir; wê gava ku evîne di dilê min de reh da û hemî kul û xemên min winda bûn. Em rûnijtin me heya êvarê ji qedehekê vexwar; wê jêvê ez bi wê re razam. Di jiyana xwe de, min çu carî xwe weha bextewar his nekiribû. Ji ber rewja wê dilê min dijewitî; û herweha min dixwest ez bextiyariya xwe bidomînim; ji ber vê yekê min ji wê pirsî, gelo dê çawa be, heke ez wê ji wê

kojka binerd birevînîm û ji efrîtî rizgar bikim. Wê gavê ew keniya û got: 'Bêdeng be(hij be) û ji halê xwe razî be! Bifiki-90

re, ji deh rojan carekê ez ji efrîtî re û neh rojan ya te me.' Lê ji hêrsê min nedikarî ez xwe ragirim: 'Na, ez ê niha wê nivîsê xira bikim da ku efrît were û ez ê wî bikujim. Ji lewre ji kujtina efrîtan, çi yên binerd çi yên ser erdî, hemiyana kêfxwej dibim.' O min pehînek li dîwêr da..."

Di wê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye û bi îtîna bêdeng ma.

Di jeva heftê û pêncemîn de wê got:

Mîrê delal, min bihîstiyê ku wî parsekî li pêj mazûbanê welê domand:

"Gava min pehîna li dîwêr da, jinikê ji min re got: 'Niha efrît tê! Ma min ji te re ne gotibû? Bi Xwedê tu min diavêjî nav bextrejiyê. Zû, qe nebe xwe xilas bike, riya ku tu hatî, her di wê rêyê de vegere.'

Ez ber bi derenceyê beziyam, ji ber lezê, min jimikên xwe û bivir ji bîr kirin. Gava ez zivîrîm ku herim wan bînim, min dît ku erd ji hev vebû û efrîtekî bi xof jê derket, diyar bû. Wî ji jinikê re got: 'Xêr e, qeza çêbûye, te weha bi hêz gazî min lîcî?' Wê got: 'Na, çu qeza çênebûne, min pîrr bêriya te lîcîribû, gava ez çûm ji xwe re vexwarinekê bêhnveker bînim, ez likumîm û li dîwêr ketim.' Lê efrîtî got: 'Tu derewan dilcî, jinika bêjerm.' Wî li der û dora xwe mêze kir, jimik û bivir dîtî. Wê gavê qêriya: 'Ev çi ne? Ev tijtên mirovan ji ku hatî?' Wê got: 'Min qet ew nedîne. Heye tune ew

bi kincên te ve zeliqîne, bi te re hatine.' Wê gavê efrît pîrr hêrs bû, hemî cilên wê ji wê kirin, ew tazî kir, dest û piyên wê ji hev vekirî bi çar singan ve girêdan; ji bo ew bipeyîve û bêje ka çi qewimiye; wî dest bi ijkençeyê lçir. Ji ber hawar û fîxana wê, ji tirsan min nikarîbû ez li wê derê bimînim; ez ji wê derê reviyam; min qapax da ser û wek berê min ax avête ser. Lê belê qasî ku mirovek dikare pojman be, ez pojman bûm; min nedikarî ez li wê jinika ciwan nefikirim; xwejik-
9i

bûna wê; û ew ijkençeyên ku wî efrîtê bi lanet, li wê dikir; li gei ku ev bîst sal bûn ku ew bi wê re bû. O herweha ez gelekî li ber diketim, ji ber ku ji rûyê min ew ijkençe li wê dibûn. Bavê min, welatê wî, haiê min yê nebaj yê êzinghûrker; dihatin bîra min, keiogirî û çavên min tije rondik min beytek der heqê xemê de xwend...

Terzî, ji windabûna min ya demdirêj, bêhuzûr bûbû; lê ez li dukanê di quncikekê de rûniştî û bûyerên ku qewimîbûn, difikirîm. Wê gavê tarzî ber bi min ve hat û got: 'Mirovekî ku dijibe farisan vaye li ber derî, di destê wî de, bivir û jimikên te, pîrsa te dike. Wî li kolanê ji hemî tarzîxaneyan pîrsiye, wan ew jandiye vir.' Ji tirsê ez bi tamamî zer bûm, reng di rûyê min de nema; wextî ez ji xwe biçûma. Di wê gavê de li ber min erd ji hev vebû û mirovê ku behsa wî dibû, diyar bû. Efrît bû! Wî ijkençeyên nedîtî li wê jinilca ciwan kiribû, lê wê çu tijt negotibû. Di dawiyê de efrîtî ji wê re gotibû: 'Ez ê nîjanê te bidim ku ez Corcîrûs ji zuriyeta îb-lîs im. Em ê bibînin, lca ez dikarim xwediyê van jimikan û vî

bivirî bînim vir, an na?'

Bêl ku saniyeyek tewj bibore, wî ez revandim. Ewil em ber bi asîman bilind bûn; pajê daketin û em ketin nava erdê. Ez bêhij ketim; lê gava em hatin hundirê kojca bin erdê, cihê ku min kêf û zewqa efsanewî ya buhujtê his kiribû; ez jiyar bûm. Gava min jinik, -ku tazî û ji lajê wê xwîn diçû- dît; çavên min bi rondikan tije bûn. Lê efrîtî bi wê girt û got: 'Va-ye evîndarê te, jinika bêedeb û jehwanî, bêexlaq!' Wê jina ciwan li min mêze kir û got: 'Ez wî nasnakim, berî niha min qet ew nedîtiye.' Efrît qeherî: 'Çima? Aha ji te re delîleke zindî, hîn jî tu li xwe mikur nayê!' Lê wê dubare kir: 'Ez wî nas nalcim, min di jiyana xwe de çu car ew nedîtiye. Di huzûra Xwedê de derew lirin ne baj e.' Wê gavê efrîtî got: Heke bi rastî jî, tu wî nas nakî, de lca rabe bi jûrê min serê wî jê 92

bike.' Wê jûr hilda û ber bi min ve hat: Ji tirs û dehjetê zerbûyî, min bi birûyên xwe îjaret dan wê ku bi insaf be, herweha ji çavên min rondik dibarîn. Wê bersîva îjaretên min bi dengê bilind da: 'Sebebê van bextrejiyan hemî, tu bi xwe yî.' Min careke din îjaret da wê û beytek ku du maneyên wê hebûn -ku efrîtî fam nedikir-, got, wê gavê ew piçelcî nerm bû; û jûr ji destê xwe avêt. Lê efrîtî jûr hilda dirêjî min kir û got: 'Serê wê jê bike, ez ê çu xirabiyê bi te nekim; û te azad bikim, berdim.' Min jûr girt, ez bi cesaret pêj ve çûm û min destê xwe rakir. Wê gavê wê bi birûyên xwe îjaret da min: 'Ma çu zerara min gîhajtiye te?' Çavên min tije rondik, min jûr avêt û min ji efrîtî re got: 'Ey efrîtê mezin, heke ev

jin bi aqil û wefakar nebana, dê serê min jê bikira; pijtî ku wê weha nekir, ne mimkin e ku ez serê wê jê bikim; ji lewre min berî niha çu carî ew nedîtiye, ji ber vê yekê ez nikarim wê bikujim; welew ku ez ji destê te qedeha jehrê ya tehl vexwim jî.' Bi van gotinan re efrîtî got: 'Haa, niha delîl çêbûn ku hûn ji hev hes dikin.'

Wê gavê, ez xulam, wî jûrê xwe yê bi lanet hilda, herdu destên wê yek li pey yekî û pajê herdu piyên wê yek li pey yekî jê kirin. Min ev tijt bi çavên xwe dîtî û min digot qey ezê bimirim.

Wê jina ciwan bi nêhênî li min mêze kir û bi çavan îjaret da min, lê efrîtî ferq lîcir û qêriya: 'Ey qîza fahîjeyan, tu niha jî bi çavên xwe fuhjê dikî.' Wî jûrê xwe rakir, serê wê jê kir û zivirî ji min re got: 'Tu zanibe, kurê mirovan, li gorî qanûna me cinan, heqê me heye da ku em jina xwe ya nesadiq bikujin. Gava min ev jina ciwan di jeva daweta wê de, ew revand, ew wê gavê dozdeh salî bû, hîn çu kes bi wê re ranezabû; ew qîz bû. Min ew anî vir; û ji deh rojan jevê ez dihatim û di jiklê yekî faris de bi wê re radiketim. Lê roja ku min ferq kir ku bi min re ne sadiq e, min ew kujt. O wê tenê bi

93

çavên xwe -ku çav li te jikand- bi min re îxanet kir. Herçî tu yî, min nekarî ez îspat bikim ku tu bi wê re razayî û te alîlcariya wê kiribe ku bi min re ne sadiq be. Ji lewre ez te nakujim. Lê ji bo ku tu li paj min henekên xwe bi min nelcî, ez ê bi jêweyekê te biêjînim da ku xurûra te bê jikestin; tu bi xwe bêje ka ez te çawa biêjînim, çi cezayê bidim te.'

Wê gavê, ez xulam, ji bo ku ez ji mirinê xilas dibûm, ez gelcî kêfxwej bûm. Min ji wê rewjê cesaret girt û min xwest ji efuya wî îstîfade bikim. Min got: 'Ey ustadê mezin Corcîrûs, tu, yê ji zuriyeta îblîsê mezin, heke tu min efu bilcî, dê Xwedê jî te efu bike, herhal tu naxwazî yekî bêguneh û bêsuc ceza bilcî?' Bi vî awayî, min ji wî lava û rica lcir, heya ku ew aciz bû û got: 'Bes bipeyîve! Ez mecbûr im te bixim bin sihrê.' Pajê wî, ez rakirim, qubeya li ser serê me ji hev belav lcir; ber bi asîman bilind bû; welê bilind bû ku dunya ji jor mîna tasekê ku av tê de be xuya dikir. Pajê daket li ser çiyayekî berz danî. Kulmek ax avêt ser min, li min rejand û pêre gotinên sihrê gotin: 'Ji jiklê xwe yê niha derkeve û bikeve jiklê meymûnekî.' O taval, ez xulam, ez ketim jiklê meymûnekî. Çi meymûn! Bi kêmasî sed salî, yelcî zîjt û qermişî. Min li ser piyekê çil da, ez giriyam, lê efrît bi jêweyeke xof kenîya û ji ber çavan wînda bû.

Wê gavê ez li bêdaletî û neheqîya qedere fikirîm; û ji tecrûbeyên xwe ez tê gîhîjtim ku qedera me ne di destê me de ye.

Min dest bi koçê, gerê lcir, ez mehekê tamam bi rê ve çûm. Bi jev ez li ser daran dimam; heya ez gîhîjtim qeraxa deryayê. Kejtîyeke bi xêl ber bi min dihat. Min li paj zinarekî xwe vejart û ez sekinîm. Gava kejtî hat qeraxê û selcinî; mirov jê daketin rejahiyê; min cesart kir, ez bi bayê bazdanê çûm, ketim kejtîyê. Wê gavê yekî kir qêrîn: 'Lez bikin, heywanê dûr bixin, nîjana ne xêrê ye!' Yekî din: 'Na em bikujin çêtir e!'

Yê sêyemîn: 'Bi vî jûrî em hûr bikin.' Min bi pencê xwe serê jûrî girt; û ji dil û hinavê ez giriyam, dilê kaptanê kejtîyê bi min jewitî; wî ez parastim. Kaptên, avêtina min ya ji kejtîyê û êjandina min li yên din qedexe kir.

Li ber bayekî xwey kejtî panzdeh rojan çû û gîhajt bajerekî mezin ku gelek rûnijtvanên (jêniyên) wî hebûn ku tenê Xwedê kare bijmêre.

Mîrê bajêr çend kole ji bo bête cem me jandibû. Wan bi-xêrhatin li bazirganan lçir û got: 'Mîrê me silavan dike û dixwaze hûn bi destnivîsên xwe yê spehî her yek rêzekê li vê parjûmenê binivîsin.' Min parjûmen ji destê wan kijand, -bi tevgerên meymûnekî- û min çil da û hinekî dûr sekinîm. Ew ditirsiyan, digot qey ez ê parjûmenê biqetînim, biavêjim nav avê. Kirin qêrîn û ez bi kujtîne tehdît kirim. Lê kaptên got: 'Bihêlin bila meymûn binivîse' Heke lçaribe binivîse ez ê wî bi kuranî qebûl bikim an na em ê mudaxele bikin. Ez çu carî rastî meymûnekî welê bi aqil nehatime.'

Wê gavê min zilpênûs hilda, min di huburdankê de dakir; pijtî ku baj hubur ragirt, min çar bend(çarîne) ku di hijê min de bûn, nivisî. Min her yek bi deststîleke cuda nivisî; ango: Stîla ewil rikaa, duyemîn rîhanî, sêyemîn çulsî û çaremîn mujîk. Gava min karê nivisînê kuta kir, min lûleya parjûmenê dirêjî wan lçir. Hemî heyirîn û pajê her yekî bi destnivîsa xwe ya herî spehî rêza xwe nivisî.

Gava parjûmen birin dan Mîr, wî tenê nivîsa min eciband; ji lewre bi çar cûreyan hatibû nivisîn; û min, pê bi nav û deng da; hîn jî ez kurê mîrekî bûm. Wî ji mirovên xwe yê hazir û koleyan re got: 'Tavil herin cem wî ustadê ku ev rêz

nivîsîne; kincên qedirbilind bidin wî, wî siwarê hêstira herî baj bilcin; û bi jahî û musîkê wî bînin huzûra min!

Bi van gotinan re yê hazir kenyan; Mîr xeyîdî û got: 'Ev çi ye, hûn bi fêrmanên min dikenin?' Wan bersîv da: 'Ey 95

Mîrê sedsala me, çi hedê me ye ku em bi gotinên te bikenin; lê divê tu zanibî, yê ku ev rêzên spehî nivîsîne ne insan e, meymûnek e ku yê kaptanê kejtîyê ye.' Mîr gelekî ecêb ma û pîrçînî pê ket û got: 'Ez dixwazim wî meymûnî bikirim.' Pa-jê emir da, da ku meymûnê bînin, Icincan lê bilcin û siwarê hêstirê bikin û bînin pêj wî.

Hatin, ez ji lçaptên bi bihayekî giran kirîm; herçiqas ewil lçaptên nedixwest min bifiroje jî. Min bi îjaretan xemgîniya xwe -ku ji mecbûriyetê min terka kaptên dilcir-, nîjan da; wan kincên qedirbilind li min kirin, ez li hêstirekê siwar lçirrim; bi def û zirneyê, musîkê, me berê xwe da serayê. Bajariyan bi awayekî ecêb û jafbûyî li wê dîmena nadir mêze dikir. Gava ez birim pêj Mîr, li ber piyên wî min sê caran erd ramûsa; û bêî ku ez xwe bilivînim, li wê derê sekinîm. Mîr ci-helcî rûniştinê nîjanê min da, min xwe li pêj wî bi rêzdarî xwar lçir. Kesên hazir hemî ji tevgerên min heyirîn. Ê herî pîr jî Mîr ecêb ma. Pijî hurmet nîjana min, wî emir da, da ku hemî ji dîwanê bi der kevin. Ji bilî min, xadimê pêjkar û koleyekî ciwan li dîwanê kesekî din nema

Mîr emir da xulaman; ku ji bo min xwarin û vexwarinê bînin. Bi her cûre xwarinê sifreyeke mîrane hate danîn ku ez-manê dev û çavên mirovî kêfxwej dikir. Wî îjaret da min ku

ez xwarinê bixwim. Min heft caran li ser hev erda li ber piyên wî ramûsa û ez li ber sifreyê rûnijtim.

Pijtî xwarinê min destên xwe paqij kirin; min zilpênûs, huburdank û parjûmenek hilda û dest bi nivisînê lcir; min du bend bi erebî nivisî. Mîr xwend û bi ecêbmayî weha got: 'Ma mimkin e, meymûnek lcaribe welê bi rêk û pêk binivîse û xwe îfade bike? Bi Xwedê, ev mucîzeyek e ku sertacê mucîzeyane!'

Anîn textê setrancê danîn û Mîr îjaret da min û pirsî, lca ez dizanim bilîzim. Min bi serê xwe got erê û berik(piyes) li ci-96

hê wan danîn. Me leyîst; min du caran zora wî bir. Êdî Mîr nedizanî ka ji çi bawer bike; hijê wî tevlihev weha got: 'Heke ev benîadem bûya, dê ji hevdemên xwe re nan nehîjta!' Mîr ji mirovê xesandî re got: 'Here cem hukumdara piçûk, qîza min, jê re bêje bila tavil were vir. Ez dixwazim qîza min vî meymûnî bibîne.'

Serekxesandî çû û pijtî midetekê tevî qîza mîr vegeriya. Bi dîtina min re wê serûçavê xwe pêça, vejart û got: 'Ey bavo, ma te ji bo vî mirovê xerîb jande pey min?' Mîr bersîv da: 'Keçika delal, li vir ji bilî min, koleyê min yê ciwan û xesandî yê ku te perwerde lcuriye û vî meymûnî kesekî din nîne.' Lê qîza wî got: 'Bavo, bizane ku ev meymûn pismîrek e. Navê bavê wî Aymarûs e û li welatekî li hêla hundir hukum dike; ev mirov hatiye sihêr kirin; yê ku ew welê kiriye efrîtê bi navê Corcîrûs ji zuriyeta îblîs e. Ewil efrîtî jina xwe ku qîza mîr Aknamûs li Ebenholtsonê, kujt. Ev meymûn insan e; miro-

vekî xwende, perwerdekirî û gelekî bi aqil e.'

Mîr gelekî ecêb ma, bi dîqet li min fikir û got: 'Ma tijtên ku qîza min dibêje rast e?' Wê gavê min bi îjaretên serî got erê û ez giriyam. Mîr berê xwe da qîza xwe û got: 'Baj e, ma tu çawa dizanî ku ew di bin efsûnê de ye?' Wê got: 'Koleye-ke pîrejin ya diya min hebû, wê hunera sihêrbaziyê dizanî; ewil ji wê fêr bûm. Pajê min zanîna xwe fireh kir; û ez du sed û heftê paragrafan ji pirtûka sihrê fêr bûm. Ji wan bi ya herî piçûk û qels mirov dikare, seraya te û temamê vî bajarî û li pey çiyayê Qafê deyne; bajêr bike golek û rûniştvanên wî jî bike masî.'

Wê gavê, bavê wê nema xwe ragirt û got: 'Qîza min, bi Xwedê, divê tu vî mirovî rizgar bikî; ez ê wî bikim wezîrê xwe, mirovekî bîaqil û sempatîk(çêlxwej) xuya dike.'

Keçika ciwan bersîv da: 'Ez ê bi dilxwejî daxwaza te bi cih bînim; bi rastî vî mirovî jî ev daxwaz, heq kiriye.'

97

Bi van gotinan re keçikê, bi kêreke ku devê wê, bi hin gotinên zimanê ibranî hatibûn neqijandin, ii nîva odeyê li erdê çembereke bi gotinên nivîsî û tilsimî kêja. Çû li nava çembereke sekinî; gelekî bêdeng çend jîfreyên sihrê gotin; ji pirtûkeke kevin hin tijt xwendin ku kesî jê fam nedikir. Ji nijkê ve derûdor tarî bû, me got qey bi saxî em di bin hilwejiîna dunyayê de man. Ê efrîtekî bi jêweyeke pirr tirsdar û xof diyar bû. Dest û lingên wî her yek bi cûreyeke ecêb xuya dibûn; ji çavên wî pêtî diçû. Em ji tirs û dehjetê mit û mat mabûn; lê dotmîrê got: 'Efrît ez silavên bixêrhatinê li te nalcim; çu pêj-

wazî li te nabin.' Wê gavê efrîtî got: 'Jinika mizir, tu çawa diwêrî li ser soza xwe nemînî? Ma me li hev nekiribû ku em dê têkel karê hev nebin, an jî li dij hev nexebitin? Li gel son-da xwe jî tu niha li dij min kar dilcî, ji lewre tijtên ku bên serê te di heqê te de ne. Binêre!' Efrîtî xwe guhert bû jêrek, bi borîn devê xwe velcir û ber bi dotmîrê êrij lçir. Wê bi lez tayek ji porê xwe kijand, bir ber lêvên xwe, formula sihrê lê xwend, ta bû jûrekî tûj. Bi jûr, wê êrij bir ser jêr; jêr kir du qet. Lê serê jêr bû dûpijkek û ji bo bi pehniya keçikê ve de, ber bi wê çû. Wê xwe veguhast bû marelcî mezin û da pey dûpijk, da ku wî bikuje. Lê dûpijk xwe guhert bû pêsingeke rej û mar jî bû gur. Pising û gur li serayê rabûn hev, jerelcî dijwar qewimî. Lê gava pisingê ferq kir ku bindset e, xwe guhart bû hinareke sor û mezin û gêrî nav bendava li bexçê serayê bû. Gurî da dû, lê hinar li kêleka bendavê li kevirê mermê ket û parça parçe bû. Dendikên hinarê li derûdorê belav bûn; lê gur jî bû dîkek û dest bi xwarina dendikan kin gava nilcilê xwe li dendikê dawiyê xist; dendik ji nav nikilê wî pengizî; qeder, çû ket navbeyna kevirên bîra avê. Dîk nedî ka dendik kude çû; ji lewre wî dest bi qêrînê kir; baskên xwe hejandin, bi nilcilê xwe îjaret dan me. Lê me, ji zimanê wî, fam nedikir; ji ber vê yekê me nedizanî lca ji me çi dixwaze.

98

Wê gavê dîk welê bi hêz bang da, me got dê niha seray hilweje; dîk dest bi lêgerîna dendikê kir. Li dawiyê wî, dendik di nav kevirên bîra avê de dît; berî ku ew bixwe, dendik ket nav bîra avê û bû masiyek; û ii nav bendavê winda bû. Dîlcî

xwe guhert bû masiyekî pirr mezin û da pey yê din. Herdu jî ji ber çavên me winda bûn; saetek welê borî. Lê wê gavê, efrît bi hemî hîdet û dehjeta xwe, ji nijkê ve xuya bû; çavên wî mîna kûreyekî agirî dijewitî; ji dev û bêvila wî pêtî derdiket. Pijtî wî keçika ciwan derket, lajê wê mîna madeyeke helandî, li pey efrîtî bû, yê ku nêzîkî li me dilcir. Ji tirsê ku em ê bi saxî bîn jewitandin, sawê em girt û em difikirîn ku em xwe biavêjin nav bendavê, wê gavê ku efrît bi êrij dihat û pêtî li me dibarand. Lê keçika li pey wî, pêtî li rûyê wî pif kir ku ew pêtî gîhajt me jî; lê berevajî pêtiya efrîtî, pêtiya wê çu xesar negihand me. Ji pêtiyên efrîtî çirûskek li çavê min yê çepê ket û ew ji binî ve texrîb bû. Çirûskek rastî Mîr hat; jêr-hêla rûyê wî û rîha wî, dev û diranên wî -qora binî- jewitand. Çirûskekê sêyemîn li koleyê xadim yê xesandî, li sînga wî ket, ew jewitî û tavil mir.

Lê keçikê, bêrawestan pêtî li efrîtî dibarand heya ku efrît bi temamî jewitî û bû xwelî. Wê gavê wê berê xwe da me û got: 'Zû, qedehek avê bidin min!' Wê hin tijtên nediyar li avê xwendin û av li min rejand û got: 'Bi navê Xwedayê mezin, careke din vegere jiklê xwe yê berê!'

Wê gavê ez bûm insan, lê ez ji çavekî xwe bûbûm û her welê mam. Ji bo dilxwejkirinê keçika ciwan weha got: 'Agir vegeriya ser eslê xwe, kesê bêkes.' O her eynî tijt ji bavê xwe -yê ku ji rîha xwe û ji diranên xwe yê jêrîn bûbû-, re got. Pajê wê got: 'Heçî ez im, qeder e, ez ê bimirim. Welê hatiye nivisîn. Kujtina efrîtî ji bo min ê karelcî ne dijwar bana heke efrît insan bana. Min ê ew tavil bikujta. Lê karê herî dijwar dendikên hinarê bûn. O ew dendikê ku ez li dawiyê lê geri-

yam, di wî dendikî de ruhê efrîtî hebû. Heke min ew bixwara dê efrît tavil bimira. Lê çi heyf min ew nedît, qeder bi awayelcî din bû. Ji ber wê yekê, çi di bin erdê de çi li hewayê çi jî li nav avê, ez mecbûrê jerekî gelekî dijwar bûm. Hercara ku wî deriyekî rizgariyê ji xwe re vedikir, min li dij wî kar dikir û derî telef dilcir; di dawiyê de, wî deriyê agir vekir. Lê gava deriyê êgir vebe, xilasî nîne, mirov ê bimire. Qederê rê da min, berî ku ez bijewitim min efrît jewitand. Berî ku ez wî bikujim, min hewl da, ku ew îmanê bi baweriya me, dînê îslamê bîne, lê wî red kir. Xwedê, cihê min yê ku li cem we vala dimîne, tije bike û sebirê bide we.'

O pajê wê gazî êgir kir; çirûsk di nav xweliyê de cardin pêketin, ber bi sîng û rûyê wê firiyan. Gava agir gîhajte rûyê wê, wê nema xwe ragirt, ew giriya, wê got: 'Ji biiî Xwedê çu xwedê tune û Muhemed resûlê Wî ye.'

Bi dawîanîna gotinên wê re, ew jewitî, bû xwelî û tevî xweliya efrîtî bû.

Wê gavê huzneke nedîtî bi me girt, min digot xwezî ez ii jûna, -cihê ku wê keçika ciwan û spehî ya ku ewqas qencî bi min lcir, jewitî bû xwelî-, wê bama. Lê çu kesek nikare li dijî fermanên Xwedê raweste.

Gava Mîr dît ku qîza wî bû xwelî, rîha xwe ya mayîn kija jand, li rûyê xwe xist û cilên xwe qetandin. Min jî wek wî lcir û bi dengê bilind li ser xweliya wê keçikê giriya. Mîr emir da; ku goreke mezin bi kumbet li ser xweliya qîza wî bête avakirin. O li ser gora wê jev û roj lembe pêketî man.

Lê herçî xweliya efrîtî bû, li ber bayê hate avêtin.
Ez xulam, ez ji wê derê çûm û min çu car bawer nedikir
ku ez ê xilas bibim. Min ne dizanî ka ez bi kude herim. Ez
careke din li tijtên ku qewimîbûn fikirîm: jûna ku mirov ji
jiyanê bibe, ji çavekî xwe bûyîn çêtir e. Berî ku ez terlca wî
bajarî bikim, ez çûm hemamê ji bo xwe bijom û rîha xwe
ioo

kur bikim da ku bi jêweyeke emin, mîna parsekekî bi riya
xwe de herim. Çu carî tijtên ku hatin serê min ji bîra min
neçûn, bi taybetî çavê min. Ez ji bajarekî diçûm yekî din he-
ya ez hatim wargehê ajtiyê, Bexdayê; cihê ku min hêvî hebû
ku fersendek çêbe da ku ez karibim serpêhatiyên xwe ji hu-
kumdarê mumînan re bêjim.

Û li vir, li Bexdayê ez rastî vî birayî hatim; kalenderê yeke-
mîn, min silav da wî, em peyîvîn heya birayê sêyemîn hat. O
me bi hev re hevaltî kir bêî ku em serpêhatiyên hev bizani-
bin; heya ku qederê û tesadufê em anîn ber vî xaniyî û em
hatin cem we.

Di vê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye û bi di-
qet bêdeng ma.

Lê gava jeva hejtêyemîn hat, wê got:

Kalenderê duyemîn weha xilas lçir: "O me bi hev re hevaltî
kir bêî ku em serpêhatiyên hev bizanibin; heya ku qederê û
tesadufê em anîn ber vî xaniyî û em hatin cem we.

Ev e, ez xulam, sebebê telefbûna çavê min û kurkirina rîha
min."

Wê gavê mazûbana ciwan got: "Çîroica te, bi rastî jî ecêb e.

Baj e, niha bi riya xwe de serbest here!"

Lê wî got: "Na, ez ji vir naçim, berî ku ez çîroka hevalê xwe yê duyemîn nebihîzim."

Wê gavê kalenderê sêyemîn pêj ve hat û dest pê lcin Çîroka Parsekê Sêyemîn

"Ey xanima spehî û navdar, bawer meke ku çîroka min ji yên hevalên min kêr ecêbtir e. Na, ew bêsînor ecêb e. Eger bextrejiya hevalên min ji ber qederê an tesadufê rû da be jî, ez bi xwe, yên ku ez êjandime, ez ji çavelcî û rîha min IOI

kirine, gunehkar nakim.

Niha guh bidin min! Ez mîr û kurê mîrelcî me. Mîr Kasîb bavê min bû, pijtî mirina wî, mîrektî bi weraset derbasî min bû; min bi aqil û edalet ji bo qenciya rûniştvanên Mîrîtiya xwe, welat îdare kir.

Min ji gerên li ser deryayê gelecî hez dikir; ji vê yekê ez ne mehrûm bûm; ji lewre paytextê min li kêlelca deryayê bû û herweha gelek girav jî bi ser Mîrîtiya min ve bûn; ku ji bo jer û parastina welêt hatibûn bi çek lcin. Carekê min xwest ez serîkî li giravên xwe bixim; ji bo seferê min deh kejtî dan hazirkirin. Pijtî sefêra me bi bîst rojan, jevekê em pêrgî dij-bayekî bûn, bi hungura sibeyê re ku êdî pêlên deryayê sist bûbûn; me li ber giraveke lenger avêt. Em ji kejtîyê daketin, çûn rejahiyê, xwarin hate çêkirin; me xwarin xwar û em du rojan li wê derê li hêviya daketina pêlan man(coja deryayê man). Werhasil em cardin ketin kejtîyê û em bîst rojên din jî çûn; lê mixabin me rota xwe winda kir; ne me, ne jî

kaptên dizanî ka em li ku derê ne. Me dîdevan jand ser dîre-
gê kejtîyê, ew hilkêja jor, pijtî midetekî ew daket û wî got:
'Li milê rastê, min li ser avê masî dîtin; lê li dûr, gelecî dûr
tijtekî ku geh rej geh spî dibû, xuya dilcir ' Wê gavê lcaptên
bi tirseke mezin jajika xwe avêt erdê; rîha xwe lcijand û qêri-
ya: 'Ew tijt dawîya me ye, kesek ji me ji vir sax xilas nabe!
Wî xwe negirt û giriya; em jî giriyan; min ji wî pirsî lca me-
sele çî ye. Wî got: 'Ey mîrê me, tu zanî, roja ku em pêrgî dij-
bayekî hatin û em ji rotayê derketin; ji wê rojê vir de, em ro-
tayê nabînin, min nekarî ez rotayê sererast bikim. Çî mixa-
bin bayelcî xwe jî nîne ku me bibe ser riya(rota) me. Ew tij-
tê ku dîdevanî ji jor dît, ew çiyayekî rej î bi miknatis e; jê re
çiyayê miknatîs tê gotin; ew, kejtîya me ber bi xwe, bêê ku
em karibin tijtekî bilcin, dikijîne. Kejtî dê ji hev bikeve û he-
mî bismar bifirin herin bi wî çiyayî ve bizeliqin. HerhaJ tu
102

texmîn dikî çiqas bismar ji kejtîyên xerqbûyî, hilwejiyayî bi
wî çiyayî ve zeliqîne. Tenê Xwedê dizane. Li ser topika çiyayî
kumbetek ji paxir ku deh stûnan radigirin heye. Li ser kum-
betê, siwarekî li pişta hespekî ye, di destê wî de rimeke ji pa-
xir heye û sînga wî bi zirxeke ji gulle pêçayî ye ku lê tilsim û
navên nenas hatine neqijandin. O divê tu zanibî, ey Mîrê
min, heya ku ew siwar li pijta wî hespî be, hemî kejtîyên ku
di vir re biborin dê bîn hilwejîn, parçekirin, hemî hesin dê
bi wî çiyayî ve bizeliqin û dê rêwî hemî bixeniqin. Çu rêyeke
felatê nîne heya ku ew siwar ji ser pijta wî hespî neyê daxis-
tin.'

Bi van gotinan re, kaptan bi awayekî tesîrkar û xemgîn giriya; me hemiyan xatir ji hev xwest; me bawer dilcir ku çu çareyeke felatê nemaye.

Bi rastî jî bi hungura sibehê re, me tesîra çiyayê bi miknatîs his lcir; gava em nêzîk bûn; bi hezaran bismar ji kejtîyê hatin rakirin û ber bi çiyayî firiyan û bi çiyayî ve zeliqîn. Pê re jî kêlekên kejtîyê ji hev çûn û em hemî gêrî nav deryayê bûn.

Piraniya me xeniqîn; hinek jî li ber pêl û bayî vir de wir de çûn. Heçî ez im, ez xulam, Xwedayê mezin, ez ji kul û derdên din yên mezintir, parastim. Min hijk bi textekî girt û xwe pêve zeliqand, pêlan ez avêtim qeraxa deryayê; quntara çiyayê bi miknatîs.

Li wê derê, min, jiverêyek ku wek derenceyek di zinaran de hatibûn kolan ber bi jora çiyê hildikijiya, dît. Min gelekî dua kirin û ji Xwedê re spas lcir; bi alîkariya Xwedê ez gîhajtîm serê çiyê. Ji ber serkeftina xwe ez gelecî kêfxwej bûm; min çok da erdê careke din ji Xwedê re spas kir; lê ez welê westiyabûm ku ez di cih de ketim erdê û di xewê re çûm. Di xewa xwe de min dengek bihîst: 'Ey kurê Kasîb, gava tu jiyar bibî, li ber piyên xwe bikole; tu ê tîrkevanekî ji paxir û sê tî-

103

rên guleyî ku bi îjaretan neqijandîne bibînî. Bi wî tîrkevanî, tîr biavêje siwarê li pijta hespê û wî bikuje; bi vî awayî tu ê mirovatiyê ji qamçiyê wî rizgar bikî. Ew ê gêrî nav deryayê bibe û dê tîrkevan ji destê te bikeve erdê; divê tu wî tîrkevanî li cihê berê vejêrî, biêxî bin axê. Pijtrte dê xumînî bi deryayê

bikeve û av bilind bibe heya ku bigehîje ser çiyayî, cihê te. Wê gavê tu ê qeyikekê û mirovekî tê de bibînî ku ew dê bêrê qeyikê dirêjî te bike. Netirse, bikeve qeyikê, lê divê tu navê Xwedê zikir nekî. Mirovê li qeyikê dê deh rojan bi te re seferê bike; pajê hûn dê bigehîjin deryaya rehmê, li wê derê mirovekî din dê te bibe welatê te. Lê ji bîr neke her tijt bi jertê wê yekê ye, ango divê tu navê Xwedê bi lêv nelcî. Ez ji xewê jiyar bûm û min tavil her tijtê ku ji min re hati-bû gotin lçir. Min bi tîrkevanî siwar gêrî nav avê lçir. Min tîrkevan xist cihê berê, ax avêt ser; pajê ava deryayê bi xumîn û gurmîn bilind bû; gîhajt cihê min. Pijî keliyekê qeyikek xuya bû û ber bi min ve hat; min spasî Xwedayê mezin kir. Li qeyikê mirovekî ji paxir ku sînga wî bi zirxekî guleyî pêçayî û bi îjaret û navan neqijandîbû, rûniştî bû. Bê ku ez gotinekê bêjim, ketim qeyikê. Mirovê ji paxir dest avêt bêran û em çûn. Em rojekê, sêrojan, deh rojan çûn. Wê gavê, li dûr, min çend girav dîtin: Ez filitîbûm. Ez gelekî kêfxwej bûm, min xwe ji bîr kir û navê Xwedê bi iêv lçir, min got: 'Xwedê mezin e, Xwedê qadir e.'

Bi van gotinan re, mirovê ji paxir, bi milê min girt û ez avêtim nav deryayê û çû, winda bû.

Heya êvarê min avjenî kir, ez welê westiyabûm ku hema bêje min nedikarî piyên xwe tev bidim; min bawer dikir ku mirin nêzîk e. Hema wê gavê min xwe hazir kir ku kelîmeya jehadetê bînim û bimirim; lê pêleke mezin hat, ez bilind kirim, avêtim qeraxa deryayê, rejahiya yek ji wan giravên ku min dîtibû. Hertijt bi daxwaza Xwedê ye.

Min cilên xwe ji xwe kirin, givajtin, min ew li ser erdê ji bo zuhabûnê raxistin û ez vezeliyam da ku rakevim. Roja dinê, ez rabûm li giravê geriyam; min bala xwe dayê; ew giraveke piçûk û li nîva wê geliyekî bi ber hebû. Çi qeza! Ez filcîrîm. Hîn ez ji yekê nefilitîme pêrgî yeke xirabtir dibim. Gava ez rûniştî û li halê xwe difikirîm ku min ji dil û can mirin dixwest, qeyikeke mezin, tije mirov, li ser deryayê, ber bi min ve dihat. Ji tirsê ku dê belayeke din were serê min, ez hilkişiyam ser darekê û min li nav jaxên wê xwe vejart. Qeyik hat qeraxê û deh kole jê daketin, wan dest bi erdê kolanê kir; pajê rastê deriyekî hatin, wan derî hilda. Ew veşeriyar qeyikê û tijtên ku mirovekî kare daxwaz bike û bivê anîn: Nan, arvan, hingiv, rûn, mî, çuwalên tije, cilên spehî û giranbiha. Wan ev tijt hemî birin malika bin erdê. O niha lcal-lalcî hêjayî hurmetê di nav koleyan de xuya dibû; ew pirr lcal, pijtxûz û pirr zêf bû. Wî bi destê lawikekî pirr çeleng girtibû, bejn û bala lêwîk welê li hev, esnek û xwejik bû ku ez bi dîtina wî re ricifîm. Hemî çûn hundirê wî xaniyê bin erdê, lê pijtî midetekî veşeriyar, ji bilî lêwîk. Ew ketin qeyikê û çûn. Gava ku ew ji ber çavan winda bûn, ez ji ser darê daketim; çûm cihê ku wan kola bû; û cardin ax avêtibûn ser. Min ax da alî, bi alîkariya Xwedê min derî yê ji dar ku qasî berdê aj bû, hilanî. Derenceyeke ji keviran xuya kir. Ez gelekî ecêb mam; ez meşiyam daketim jêr. Ez rastî eywaneke pirr mezin hatim; eywan bi hevrijim û jîfonan hatibû raxistin. Lawik li navbera findên pêketî, guldank û sêniya mêweyan, li ser dîwanê veketî û bi bawejînekê xwe hênîk dikir. Gava wî ez dî-

tim, ew gelekî tirsiya; lê bi jêweyeke herî nerm min weha got: 'Selamueleykum!' Wî bi jêweyeke piçekî sakin bersîv da: 'We eleykume selam.' Min lê zêde kir: 'Ez xulam, tu her bextiyar bî! Ez kurê mîr û bi xwe jî mîr im; Xwedê ez jandim da ku ez te ji vir, ji binê erdê rizgar bikim; ji vî cihê ku

105

te, ji bo tu bimirî, danîne; were em bibin dostê hev, bi dîtina te aqil ji serê min diçe.'

Wê gavê xorto bijirî; ez dawetê ser dîwanê, li kêlelca xwe rûniştinê, lçirim; û got: 'Belê begê min, ez nehatime vir ji bo mirinê, beravajî ez hatime ku ji mirinê xilas bibim. Lê belê, divê tu zanibî ku ez kurê zêrfirojekî me; ku li temamê dunyayê bi dewlemendiya xwe tê naskirinê; ew kerwanên bazirganiyê dijeyîne hemî welatan da ku mucewheran bifirojin mîr û hukumdaran. Gava ez hatim dunyayê êdî bavê min bi emir bû, wî ji remilavêjan bihîst ku ez ê beriya dê û bavê xwe bimirim. Yekî xwende ku dikarî qedera min li stêrkan bixwîne weha got: 'Mîrekî kurê mîrelcî din bi navê Kasîb dê kurê te bikuje; ev tijt dê pijtî çii rojan ku Mîr siwarê ji paxir gêrî nav avê lçir, dê biqewime. Bavê min î zêrfiroj, pirr xemgîn bû; wî ez bi îtîna mezin û perwerde kirim heya ez gîhajtîm panzdeh saliya xwe. Lê gava wî bihîst, siwar gêrî nav avê bûye; wî bi kul û keder dest bi jîne lçir û bi carekê ve kal bû. Wî ez anîm li vir danîm; ev xanî ji zûde hatibû hazir kirin; da ku ez di bin erdê de ji destê wî mîrê ku siwar gêr lçiribû, bifilitim. Him bavê min û him jî ez em gelecî bawer in ku dê kurê Kasîb li vir, li vê girava nenas, min nebîne.'

Pijî van gotinên xortê ciwan, ez xwe bi xwe fikirîm: Gelo çawa yên ku stêrkan dixwînin dikarin ewqas xelet bin? Bi Xwedê, vî lawikê ku ruhê min xistiye nav êgir, kujtina wî dê kujtina min bi xwe be. Min got: 'Ax, kurê min, Xwedayê qadir dê çu carî izinê nede da ku kulîlkekî welcî te bê qurmiçandin. Ez li vir im da ku te biparêzim; û ez ê li temamê jiyana xwe li cem te bim.' Wî bersîv da: 'Bavê min ê pijî bîst û çar rojan were min bibe; ji ber ku pijî wê demê êdî talûke namîne.' Min got: 'Ey kurê min, ez ê, di vê mideta van bîst û çar rojan de, li cem te bim; û pajê ez ê ji bavê te rica bilcim da ku bihêle tu bi min re werî welatê min, bibî dostê min û

106

warise

min.

Wî xortê ciwan kurê zêfirojî bi gotinên dostane û munasib spasî min lçir. Min ferq lçir ku ew bi min ve û ez bi wî ve têm girêdan. Em bûn dost û me bi jêweyeke dostane sohbet dikir. Me ji wan hemî xwarinên xwey û jêrîn ku hebûn xwar; yên ku midetê salekê têra sed kesî dikir. Pijî xwarinê em veketin û em heya sibeyê razan. Serê sibê jiyar bûm; min xwe jûjt, min tejta ji paxir bi ava bêhnên xwey tije kir da ku lawik jî xwe bijo. Min xwarin çêlçir, me xwar, me lîstikên cûrbicûr leyistin; me bi kêfxwejî wextê xwe heya êvarê bo-rand. Me êvarê mîheke bi dendikê behîvan, mewij, mîsket, baharatên bêhn-xwey û îsot dagirtî, çêkir; me bi xwarinê re ava teze vexwar. Me zebej, pasteyên hingivîn û gelek cûreyên jêrînahî ku bi hingiv, dendikê behîvan û baharatan hatibûn

çêkirin, xwarin. Wek jeva berê em çûn razan. Bi vî awayî me bîst û çar roj bihurandin.

Ji ber ku niha xortê ciwan li hêviya bavê xwe bû, wî xwest xwe baj bijo. Min jê re av di berojêke mezin de germ kir, hi-nek ava sar bera ser da, da ku germiyêke xwe çêbe. Xorto ket avê, min ew lûfik kir; mesaj kir, bi gulavên xwe ew mist da. Min pajê ew li ser dîwanê danî, xewliyeke bi zîv neqijandî li serê wî gerand; min jê re vexwarineke xwe û hênîk anî; pajê ew di xewê re çû.

Gava jiyar bû, daxwaza tijtekî xwarinê kir; min jê re zebe-jelcî herî baj û mezin anî. Min zebej li ser lihêfe danî, ez çûm ser textê razanê da ku kêreke mezin ku li jora textê razanê bi dîwêr ve bû, bînim. Xorto bi henekî destê xwe dirêj lîcî û bi lingê min girt. Ez yê xurilcî bi ser wî ve ketim û kêra destê min di dilê wî de çû û ew tavil mir.

Ez bi jêweyêke hov qêriyam; min li rûyê xwe da, cilên xwe qetandin; bi girîn û nalîn min xwe avêt erdê. Dostê min yê ciwan miribû; qedera wî ya ku stêrkzanan gotibû bi cih hati-
107

bû. Lê min destên xwe ber bi Wî yê herî jor rakirin û min got: 'Ey Mîrê dunyayê, heke min sêcekiribe ez ji ezabê re hazir im!' Wê gavê ez ji mirinê re amede bûm; lê, ez xulam, çu car duayên me nayên qebûl kirin, çî yên baj çî yên nebaj. Min êdî tehemul nedikir ku ez li wir bimînim û min dizanî di dawiya roja bîst û çaremîn de, dê bavê wî, zêfiroj were, ez di derencekan re hilkijiyam, min derî girt; ax wek berê avêt ser.

Lê min dixwest ez bibînim ka dê çawa û çi bibe; ji lewre min xwe vejart da ku bi destê wan deh koleyan bi ezaba herî giran neyê ku jtin. Ez hilkiyam ser dareke mezin. Min xwe vejart û berê xwe da deryayê û min mêze kir. Pijî saetekê qeyik tevî lcalo û deh koleyan xuya bû. Ew hatin rejahiye, bi lez çûn ber darê, lê wan wê gavê dît ku ax ne wekî berê ye; tirseke mezin bi wan girt, kalo bi tamamê xwe winda lçir. Koleyan ax dan alî, derî ralçirin. Mirovê kal bi dengekî bilind gazî kurê xwe kir; lê kurê wî bersîv neda; ew li wî geriyên û li dawiyê ew li ser dîwanê kujtî dît.

Gava kalo kurê xwe dît, ji xwe çû; ji koleyan jî, nalîn û girîn bilind dibû. Wan xorto hilda anî jor, jê re gorek kolan û ew defin kirin; pajê wan kalo û tijtên din, birin li qeyikê danîn.

Gava qeyik ji ber çavan winda bû, ez ji ser darê bi dilekî xemgîn daketim. Ez li qezayê fikirîm û gelekî giriyam. Bi jêweyeke gêj ez di giravê de geriyam; jev û roj. Pajê min dît ku vaye av vedikije, dadikeve, dimiçiqe. Rojeke xwey min dît vaye deryaya di navbera giravê û rejahiya mezin zuha bûye. Wê gavê min ji Xwedê re spas kir, ji lewre li dawiyê Wî dixwest min ji wê girava bêyom rizgar bike. Ez bi lez û bez mejiyam û gîhajtîm rejahiya mezin. Bi zikirlçirina navê Xwedê ez ji sibehê heya êvarê çûm. Wê gavê li dûr min agirek dît. Bi bawerî û hêviya ku hin mirov li wê derê mîhekê sor dilcin,

108

min lezand. Lê gava min nêzîkahî li wî çihî kir, min dît ku ne agir e; lê kojkeke ji paxir e; û ji ber daketina rojê welê di-

çurisiya, wek êgir xuya dikir.

Ez ji dîtina wê dîmenê, wê kojka muhtejem a ji paxir, pirr ecêb mam. Wê gava ku min lê mêze dikir, deriyê kojê vebû û ji kojê deh mirov bi gewdeyên xwe yên xweji li hev û bi rûyên xwe yên pirr xwejik ku ji ber xwejîkbûna xwe spasdarê Avakar bûn, hatin der. Kalekî hêjayî hurmetê jî bi wan re bû. Lê belê ya ecêb ew mirov hemî ji çavê xwe yê çepê mehrûm bûn.

Ez fikirîm: Bi Xwedê, bi rastî jî ev tesadufeke ecêb e! Çawa, çî bûye ku ev deh mirov hemî pêrgî bêjansiyê bûne û ji çavê xwe mehrûm mane. Gava ez welê selcînîbûm û difilcîrîm, ew mirovên ciwan hatin û silav dan min. Min jî silav li wan lîcîr û serpehatiya xwe ji destpêkê heya dawiyê ji wan re got. Lê ne hewce ye, ez ji te re dubare bikim, ez xulam.

Ez welê gêj li wê derê, wan got: 'Fermo were mala me, dê comerdiya me te kêfxweji bike.' Em ji gelek eywanan re yên ku bi hevrîjim û jîfonan raxistîbûn bo rî; li dawiyê em hatin eywaneke ji yên din mezintir û spehîtir. Li eywanê deh sedirên bi nivînpoj û yek jî -ya dawîn- bînivînpoj hebûn. Kalo çû ser sedira bînivînpoj ya yanzdemîn, yê din jî her yek li ser sedirekê rûniştin û wan ji min re got: 'Li dawiya eywanê rûnîke û der heqê tijtên ku tu ê bibînî, tijtekî nepirse.'

Pijtî midetekê, mirovê kal çû; pajê wî xwarin û vexwarin anî, me hemiyar xwar û vexwar.

Pajê mirovê kal ji ber mayînen xwarin û vexwarinê rakirin û li cihê xwe rûnişt; lê wan xortan got: 'Bi çî rûyî tu rûdinî, berî ku tijtên pêwîst ji bo me bînî da ku em wazîfeya xwe pêk bînin?' Bê gotinekê kalo rabû, çû derve. Kalo li ser serê

wî tejtê ku çarjefekî ji hevrijîm avêtibû ser û di destê wî de fanosek vegeriya û li kêleka xortê herî nêzîkî derî, danî. Wî 109

ev tijt deh caran tekrar kir heya ku hemî xort bûn xwedî tejt û fanosekê. Lê kalo tijtek neda min, ji ber vê yekê ez aciz bûm. Wan xortan çarjef rakirin, min dît ku di tejtê de xwelî, komir û komirên daran heye. Wan hemiyên xwelî li serê xwe lçir; komir di rûyê xwe de dan; û komirên daran ber bi çavê xwe yê rastê birin û giriyan; û bi girî û nalîn weha digotin: 'Me ev tijt heq lçiriye, di heqê me de ye, pijtî wan neqencî û xirabiyên me.' Wan ew nalîn û lçalîna xwe heya hungura sibê domand. Wê gavê kalo tejtê avê anîn; wan xwe jûjt, paqij kir û cilên pak li xwe lçirin û bûn wek berê." Di vê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye, bi îtîna bêdeng ma.

Di jeva hejtê û pêncemîn de wê weha got:

Parsekê sêyemîn çîroka xwe domand:

"Wê gavê lçalo tejtê avê anîn, wan xwe pak lçir û cilên paqij li xwe kirin û bûn wek berê.

Ez xulam, gava min ew tijt dîtî ez gelecî ecêb mam; lê min cesaret nekir da ku ez ji wan bipirsim; ji ber ku qedexê bû. Jeva pijtî wê, ya sêyemîn, çaremîn welê bihurî. Êdî min nekarî ez xwe ragirim û min got: 'Gelî efendiyan, divê hûn ji min re bêjin, lca ji bo çî hûn ji çavelcî xwe bûne û mebest ji xwelî, komir û komirê daran çî ye, bi Xwedê, mirin ji vê meraq û nezaniyê çêtir e.' Wê gavê ew qêriyan: 'Hey bextrej, tu çî dibêjî? Heke em ji te re bêjin, ji bo te mirin e, pirr xirab e!'

Min got: 'Ji vê meraq û nezaniyê ji min re mirin çêtir e.'
Wan got: 'Bila haya te ji çavê te yê çepê hebe, lê miqate be!'
Min bersîv da: 'Tu fedeyeke çavê min yê çepê nîne heke ez her di vê jik û gumanê de bim.' Wan got: 'Baj e, bila qedera te jî bi cih bê; ew tijtê hatiye serê me dê bê serê te jî; û sebebê vê yekê tu bi xwe yî, xeletî ji te ye; sûcdar tu yî. Herweha pijtî ku tu ji çavê xwe yê çepê bibî jî tu nikarî werî cem me, ji ber ku li vir bi tenê deh sedir hene û ya yazdemîn nîne.'
II O

Niha mirovê kal tevî mêjinekê hat hundir; wan mêjin ser jê lçir û gurand. Wan got: 'Niha em ê te têxin nav postê vê mêjinê û devê postê bidurûn; em ê te li ser banê vê kojê deynin. Wê gavê teyrê mezîni ku navê wî Rok e; û welê bi hêz e ku dilcare bi penceyên xwe fîlekî rake, ew ê bêje qey tu mêjin î, dê te hilde ber bi ewran rake û li ser çiyayekî bilind ku çu insan nagehin wir, deyne; da ku te bixwe. Lê bi vê kêrê tu ê çerm jêbikî û ji nav çermî derkevî; ew teyrê xofyê ku insanan naxwe, dê bifire; here. Pajê tu ê bimejî heya tu bigehî qesreke ku ji vê kojê deh caran mezintir û hezar car spehîtir e. Qesir bi zêr xemilandi ye; di dîwarên wê de kevirên mezîni yê mucewher, bi taybetî zumrut û mircan hatine danîn. Tu ê di deriyê vekirî re herî hundir, wekî me berê kiriye û pajê tu ê bibînî ka çi dibe. Me çavên xwe yê çepê li wir danîn; em hîn jî cezayê wê yekê dikijînin ya ku me heq lçirî ye; ya ku her êvar em telçrar tekrar pê diêjin; ku tu jahid î. Bi kurtî ev e serpêhatî û çîroka me. O heçî tu yî, bila qedera te pêk bêf

Pijî van gotinan ez li ser soza xwe mam; wan kêrek da min; ez xistim nav çermê mîhê û birim li ser banê kojê danîm; ew çûn. Pajê ji nijê ve min his lçir ku ez ji alî wî teyrî ve hatim rakirin. Teyrî ez birim li ser çiyayekê berz danîm. Min çerm jê lçir, jê derketim; teyr firiya çû. Min ew dît; ew teyrêkî spî û mezin, bi baskhejanên giran firiya, ew bi qasî giraniya deh fîlan û bi qasî bîst deveyan pêkve mezin bû. Bi meraqeke mezin, bê sebir ez bi rê ketim; eynî rojê ez gîhajtîm wê qesrê. Li gel salixdana wan xortan jî, ez bi dîtina wê qesrê mit û mat mam; ji ber ku ji salixdana wan xortan gelekî spehîtir bû. Ji bilî deriyê mezin yê ji zêr, neh deriyên din jî hebûn, her yek ji cûre darekî saxlem, herî hêja û giranbiha ku bi zêr û mucewheran hatibûn neqijandin; û ber bi eywan û bexçeyan vedibûn ku têde hemî gencîneyên erd û

iii

deryayê komkirî bûn.

Di eywana yekemîn de ez rastî çil qîzên ciwan hatim; ew welê spehî bûn ku ez gêj bûm û min nedizanî lca ez li kîjan lçeçikê mêze bikim. Wan bi dengêkî xwe jî jêrîn bixêrhatin li min kir; û got: 'Mala me, mala te ye, mêvanê delal, em hemî di xizmeta te de ne.' Wan ez dam rûnijtinê, ew jî li ber piyên min rûnijtin: 'Ey mêvanê qedirbilind, em kole û malên te ne, tu xwediya me yî; sertaca serê me yî.'

Pajê wan dest bi xizmeta min lçir: Yekê ava germ û xewliyên nerm anîn, piyên min jûjtin; yeke din bi mesînekî zêrîn ava bi bêhnkulîlk li destê min kir, yeke sêyemîn cilên hevrîjimî û kemberek ku bi zêr û zîv hatibû neqijandin li nava

min girêda; yeke çaremîn taseke vexwarin ku jê bêhna kulîl-kan difuriya dirêjî min kir. Yekê li min mêze kir, yeke din bi min re bijirî; yeke sêyemîn çav da min; yeke çaremîn beytek xwend; yeke pêncemîn destên xwe dirêjî min kirin û yekê got: 'A', yeke din 'O!', yeke sêyemîn 'Ax, tu ruhê min!' yeke çaremîn 'Ax dilê min!' yeke pêncemîn 'Ax, agir min dijewitîne!'

Wan dest bi firikandin û givajtina lajê min lçir û got: 'Ey mêvanê delal; ka meseleya xwe bêje, ji ber ku ji zû ve em li vir in; bê zîlam in; û niha em bi hatina te bextewar in.' Wê gavê ez salcin bûm û min bejek ji meseleya xwe ji wan re got; wext bihurî û bû êvar.

Wê gavê wan bê hejmar find anîn, li eywanê danîn; welê ronî bû ku mirov digot qey tava nîvro ye. Wan sifre danî, xwarinên bijarte û vexwarinên sermestiyê rêz kirin; gava min xwarin dixwar, wan musîkeke zindî ku miriyan ji gorê radike lê dida; bi dengên efsûnkar stran digotin; û çend ji wan dest bi reqsê kirin.

Pijtî wan hemî kêfxwejî û jahiyên wan got: 'O, delalo, niha wexta kêfxwejiya herî hêja û rastî ye. Niha yekê ji me ji

112

xwe re hilbibijêre; û ji dilêjtina yê din netirse, ji ber ku em her yek jevekê bi te re dimînin û pajê cardin ji serî dest pê dikin.'

Lê wê gavê, ez xulam, min nedizanî ka ji wan xwijkan kêjanê hilbibijêrim, ji lewre hemî wek hev û arzûkar bûn. Min çavên xwe girtin; destê xwe dirêj lçir û yek ji wan neqand.

Min çavên xwe vekirin; lê min tavii girtin, ji ber xwejiya wê min nedikarî ez li wê mêze bilcim; çavên min venedibûn. Wê destê xwe dirêjî min kir, ez birim. Ez bi jev li cem wê mam; ez çil carî bi wê re raketim; her carê wê digot: 'Ax, delalo!' Wê ez givajtim, min dev li wê kir, wê ez quruncandim; me heya sibeyê bi kêf û henekên welê dom kir. Ew jeva pîroz bi wê jêweyê borî.

Bi wî awayî jev li pey jevê, geh bi vê keçikê geh bi ya din; bi êrijên geh ji paj, geh ji pêj, me bi kêfxwejî jev li jevan zêde kirin. Salek bi wê jêweyê bê ku me hayî jê hebe borî. Her sibehê keçika jeva bê dihat ez dibirim hemamê, lajê min dijûjt, ez mesaj dikirim û hemî ew avên bi bêhnên xwe ku Xwedê dane ebdên xwe di canê min de dida û digivajt. Û nîhayet dawiya salê hat. Sibeyekê hemî keçik pêlcve ketin hundir, cem min; bi dengê berz digiriyan; porê xwe di ser rûyê xwe de berdan û gotin: 'Ax, roniya çavên me, niha wek yên din, divê em terka te bikin. Divê tu zanibî ku tu, yê ne ewil î; beriya te gelek kes di ser me re derbas bûne, bi me re razane. Lê çu kesî ji te bajtir nekiriye û demeke dirêj ne domandiye. Bê jik tu, ji nav wan yê herî muhtejem û bi heraret î. Ji iewre em jî nikarin ji te biqetin, dûrkevin.' Min pirsî: 'Baj e, çima, ma hûn mecbûr in, herin? Ji ber ku ez jî naxwazim ji vê kêf û zewqa ku hûn dibexjînin, bêpar bimînim.' Wan got: 'Divê tu zanibî ku em hemî qîzên mîrekî ne; lê diyên me cuda ne. Pijî ku em mezin bûn û pêve, em li vir li vê qesrê dimînin. Her sal Xwedê berê delalekî dide vir ku

"3

em wî û ew jî me bi kêf û zewqê tatmîn dike. Lê her sal, çil rojî, divê em ji vir herin cem dê û bavê xwe, ziyareta wan. Û niha wextê vê yekê ye.' Wê gavê min gbt: 'Keçikên delal, madem welê ye, ez li vir li benda we disekinim, ji Xwedê re dua dikim, heya hûn vegerin.' Wan bersîv da: 'Bila daxwaza dilê te bi cih bê. Aha va ne ji te re kilîtên hemî deriyên qesrê. Tu dikarî li vir bimînî û bibî efendiyê serayê. Lê divê tu deriyê li bexçeyê yê herî dawiyê yê ji paxir venekî; heke tu vekî tu nema karî rne bibînî; li gorî qederê jî dê belayeke mezin were serê te.'

Hemî hatin cem min, ez hembêz kirim, ramusam û bi girîn gotin: 'Xwedê bi te re be.' Bi çavên xwe yên tijî rondik li min mêze kirin û çûn.

Bazina kilîtan di destê min de, ez çûm derve, da ku ez li serayê bigerim, ji ber ruh û canê min berê bi keçikan ve mijûl bû, min nekarîbû ez li serayê bigerim.

Min deriyê ewil vekir, ez çî bibînim: Bexçeyekî mezin yê darên fikiyan, bexçeyekî welê xwejik û mezin, min çu carî nedîtibû. Di nav daran de coyên avê hatibûn çêkirin; daran wisa xwey av hildida ku mêweyên wan ecêb gir dibûn. Min mêwe tam lçirin; mûz, xurme yên bi qasî tiliyan, hinar, sêv û hêjîr. Gava min têr xwar, min ji Xwedê re julcir lçir û deriyê duyemîn velcir.

Ji bêhnxwejî, spehî û gejbûna kulîlk û gulên li bexçeyê bêvil û çavên min zorbirî bûn. Li wir hemî kulîlkên ku li bexçeyên serayên dunyayê hene, hebûn: Yasemîn, fulya, gul, binevj, sumbil, karanfîl, lale, û gelekên din. Pijî bêhnkirina hemî cûre kulîlkan, min yasemînek hilda, ber bi bêvila xwe

bir; bi bêhnkêjaneke kûr min bêhn kir û ji Xwedê re ji bo wê yekê spas kir.

Min deriyê sêyemîn velcir; guhên min bi deng û stranên çûk yên renga reng û cûrbicûr hatin dagirtin; çûk di qefese-
"4

ke pîrr mezin de bûn ku ji du darên herî baj û giranbiha hatibû çêkirin. Tasikên avê yên çûkan ji zîv û tasikên qût jî ji zêr bûn. Erd paqijkirî, avê bi xwijîna xwe û bi stranên çûkan pêkve ji Xwedê re spas dikir. Min guhdariya wê aheng û dengxwejiyê kir; heya ku tariyê xwe li erdê pêça, pajê ez ji bo razanê vegeriyam.

Lê roja dinê, bi lîcîlîta çaran min deriyê çaremîn vekin û li wê derê, ez xulam, min wisa tijt dîtin ku insanekî tew nikare wan tijtan xeyal jî bike. Di nîva hewjeke mezin û fireh de, qubeyeke berz, bilind dibû ku li ber qubeyê çil derence ji somalcî ber bi çil deriyên ji abanoz çêkirî û bi zêr û zîv neqijandî hildikijiya, hebû. Her deriyek li odeyekê vedibû; û hemî jî vekirîbûn. Li her odeyê gencîneyek hebû ku hêjayî temamê Mîrîtiya min bû. Li eywana ewil gelek sandoq tije mircan bûn ku her yek bi qasî hêlca kevokekê bûn; û wek heyvekê dibiriqîn. Eywana duyemîn ji ya ewil dewlemendtir bû, bi kevirên elmas, yaqût, yaqûtê saîmanî tije bû. Li ya sêyemîn sade zumrut, ya çaremîn kuiçeyên zêr, li ya pêncemîn sîkeyên zêr ji hemî welatan, li ya jejemîn zîvê sade, li ya heftemîn sîkeyên zîv ji hemû welatên dunyayê, hebûn. Eywanên din jî hemî bi hêjayên erd û deryayê yên wek mucewher, topaz, fîrûze, sumbil, kevirên yemenî, kevirên birqok yên gi-

ranbuha ji hemî rengan, guldank ji mîneralên kesk, gerdenî, bazin, kember û hemî cûre cewahîrên xemlê ku li gencineya jah û mîran hene, tije bûn.

O min, ez xulam, awir û destên xwe ber bi asîman rakirin û ji Xwedê re, yê herî berz re, ji bo wê qencyê spas kir. Pajê her roj min hin derî vedikirin û mit û matbûna min, heyîrîna min zêde dibû. Roja çilemîn tenê kilîtek mabû; ango yê ku deriyê ji paxir vedikir. Ez li wan çil keçên ciwan fikirîm; ji bîranînên wan ez gelekî dilxwey bûm; ji jêrîniya wan, ji lajê wan yê ter û teze, ji hêtên wan yê esnek û xwejlihev, ji "5

berzikên wan yên narîn, ji kulîmekên wan yên girover û nerm; bi qêrîn û dengên wan yê bi agir û pêtî, yc lertzok: 'Ax çavê min!', 'Ox jiyana min, dilê min!', 'bi Xwedê îjev jeva xêrê ye!' Ez mest bûm.

Lê Şeytên her kilîta di destê min de dixist bîra min, lciîlt di destê min de giran dibû, bi wî awayî ez ji rê derketim, min nema xwe girt; ez çûm, min derî velcir. Min tijtek nedît, lê bêhneke pîs û giran bi scr min de girt û ez ji xwe çûm; ez li hêla derve ketim erdê; derî cardin hat girtin. Gava ez jiyar bûm, her min bi ya Şeytên kir û min cardin derî vekir; ez li derve sekinîm heya ku bêhn sist bû.

Ez çûm eywaneke mezin, bi find û lembeycn ji zîv û zêr ku ji wan bêhna emberê radibû, ronî dibû. Li nîva eywanê hespek sekinî bû, hespekî rej, bi tenê stêrkeke spî li eniya wî bû; û herweha deqên spî li jora çoka pêjî, ya çepê û çevoka paj ya rastê hebûn. Zîne hespî bi zêr neqijandî bû; afir bi

kuncî û cehekî baj tije; cirnê avê bi avelce bêhnxwey tije bû. Hesp yên ku kula dilê min bûn, ji lewre li welatê xwe ez siwarê herî jîrek bûm, ez fikirîm ew hesp tam li gorî min bû. Ji ber wê yekê min bi hefsarê wî girt, ji eywanê bi derxist anî bexçe; û ez lê siwar bûm. Lê wî hespî xwe ji cihê xwe neliwand. Wê gavê min bi zincîra ji zêr li stoyê wî da. Hespî, tavil du baskên mezin û rej vekirin; ku min berê baskên wî ferq nekiribûn. Bi xofkire hîre hîr, sê caran simekî xwe li erdê xist; û bi hewa ket, difiriya.

Erd li bin me winda bû; nema xuya dikir. Wek siwarekî baj min xwe li pijta hespî jidand. Dawiyê hesp daket li ser banê wê seraya sor, ya ji paxir, ya ku ez li wir pêrgî mirovên ciwan û yekçavî hatibûm. Hesp rabû ser piyên dawî û ez ji pijta xwe avêtim; bi serê baskekî xwe çavekî min kor lçir, tehrîp lçir; pajê bi hewa ket, firiya ji ber çav winda bû. Destekî li ser çavê min yê bi birîn, ez li ser banê çûm û ha-
116

tim; ez dinaliyam. Wê gavê ew deh mirovên ciwan hatin derve û gotin: 'Te guh neda me, tu jî niha rewja xwe bibîne. Em nikarin ji te re bêjin fermo, li cem me be, ji ber ku ji niha ve em deh kes in; lê heke tu bidî ser vê û wê rê tu ê bigehî Bexdayê; cem hukumdarê mumînan, Harûn el-Rajîd; ku me navûdengê wî bihîstiye; tu li wir dikarî xwe bisipêrî wî, tuûqederaxwe.'

Pijtî ku min rîha xwe kur kir, cilên parsekan li xwe kir da ku pêrgî bextrejiyên nuh neyê; ez jev û roj mejiyam û ez li çu derê ranewestam, heya ku ez gîhajtîm vê herêma ajîtiyê,

Bexdayê. Li vir ez rastî van herdu mirovên yekçavî hatim û min silav da wan û got: 'Ez xerîb im.' O wan bersîv da: 'Em jî xerîb in.' Bi vê jêweyê em hatin vî xaniyê rehmê, ez xulam. U niha êdî malûmê te ye lca ji bo çî ez yekçavî me û min rîha xwe kur kiriye.'

Pijtî vê meseleya tuhaf, mazûbana ciwan ji kalenderê sêyemîn re got: 'Bi riya xwe de here, ez te dibexjînim, efu dikim.'

Lê kalenderî weha got: 'Bi Xwedê heya ez meseleya yê din nebihîsim, ez ji vir naçim.'

Keçika ciwan berê xwe da Xelîfe, Gafar û Masrûrî û got: 'Dora we ye, bêjin, behs bilcin!'

Gafar pêjve hat; tijtê ku wî berê ji keçika dergevan re gotibû, dubare kir.'

Keçika ciwan berê xwe da wan hemiyan û weha got: "Ez we hemiyan efu dikim. De lca îcar bi riya xwe de herin!"

Gava ew hatin derve, li kolanê, Xelîfeyî ji kalenderan re got: "Hevalino, hûn ê kude herin?" Wan bersîv da: "Em nizanin." Xelîfeyî got: "Fermo, bi me re werin, îjev bibin mêvanê me." O wî ji Gafarî re got: "Van bi xwe re bibe, bila îjev li cem te bin; sibeyê tevî wan were serayê, em mêze bikin lca em dikarin çî bikin." Gafarî emrê Xelîfeyî bi cih anî.

«7

Xelîfe çû seraya xwe, lê bi jev nekarî raze. Serê sibê çû li ser textê xwe rûnişt; izna hemî mirovên resmî yê dewletê da, da ku karê xwe pêjkê bikin. Pajê wî berê xwe da Gafarî û got: "Wan her sê keçên ciwan, herdu segan û her sê kalende-

ran bîne vir!" Gafarî ji bo bicihanîna fermanê lez kir. Ew hemî dan anînê. Wan keçên ciwan li pêj Xelîfeyî serpûjên xwe berdan; lê Gafarî got: "Em ê we bibexjînin; ji lewre bêî ku hûn bizanin em kî ne, we em efu kirin; û we bi me re gelecî dostane muamele kir. Niha hûn li ber destê mîrasxurê Abasiyan yê pêncemîn, Harûn el-Rajîd in; ji lewre ji bilî rastiye çu tijtekî din nebêjin."

Wan keçên ciwan guhdariya Gafarî, yê ku bi navê hukumdare mumînan dipeyîvî, lîcin; keçîka temen mezin pêjve hat û got: "Ey, melîkê mumînan, meseleya min ewqas ecêb e, heke hin binivîsin, dê gelek kes jê tecrube û dersan wergînin."

O wê dest pê lîcin:

Çîroka keçîka ciwan ya yekemîn

"Ey melîkê mumînan, navê min Zubeyda ye; xwijka min ya ku ji te re derî vekir navê wê Amîna û xwijka min ya ku herî ciwan e, navê wê jî Fahîma ye. Bavê me her sêyan jî yek e; lê ne diya me. O ev herdu dêlik xwijkên min, ji dê û bavê min in."

Gava bavê me mir, ji me re pênc hezar dînar mîras hîjtibû.

Me di navbera xwe de wekhev dabêj kir. Amîna û Fahîma bi malî çûn cem diyên xwe; ez û herdu xwijkên xwe em li cem hev man. Ez piçûlca xwijkan im, lê ji Amîna û Fahîmayê mezintir im.

Pijtî mirina bavê me bi demeke kurt herdu xwijkên min

118

yên mezin zewicîn; lê pijtî zewacê mideteke din jî li cem

min man. Pajê mêmên wan tevî pere -her yek hezar dînar- û jinên xwe ji bo bazirganiyê sefer kirin; û ez tenê hîjtim.

Çar salan li xerîbiyê man. Wan zilaman mal û pereyên xwe xilas kirin; li xerîbiyê jinên xwe berdan, ew bi tenê hîjtin. Li wê derê xwijkên min gelekî dijwarî dîtin û li dawiyê wek parsekan hatin cem min. Ewil, min ew nas nekirin; lê pijtî ku wan dest bi axaftinê kir û xwe dan nasîn, dilê min gelecî bi wan jewitî; min ew jandin hemamê, kirasên nuh dan wan. Pajê min ji wan re got: 'Hûn xwijkên min yên mezin in; ez xwijlca piçûk im. Ez we wek dê û bavê xwe qebûl dikim. Mîrasê ku para min bû, bi saya Xwedê, zêde bûye, em ê bi hev re bijîn û bixwin.'

Min ew di nav xweji û qencyê de hîjtin; ew li cem min, mala min diman; salekê wisa bihurî, her tijtê min yê wan bû jî-

Rojekê hatin cem min û gotin: 'Zewac ji bo me bajtir e; welê bi tenê jiyîn dijwar e. Em gelekî aciz dibin.' Min got: 'xwijkên delal, di vê dewrê de mêrelcî baj û bi jeref dîtin zehmet e; ez ne bawer im ku hûn ê bi zewacê bextewar bibin; ma we tecrubeya xwe ji bîr kiriye!'

Lê wan guh neda min; gotin em ê bizewicin. Min bi pereyên xwe mesrefa wan kir; ew zewicîn û bi mêmên xwe re çûn. Di demeke kurt de, mêmên wan ew xapandin; tijtên ku min dabû wan ji wan stendin, ew welê jerpeze û perîjan hîjtin û winda bûn. Wê gavê careke din bê pere, pêxwas vegeyran cem min û gotin: 'xwijka delal, me sûcdar neke, tu xwijka piçûk î, lê ji hêla famkirinê ya mezin î. Em soz didin te ji vir û pêve em behsa zewacê nakin.' Wê gavê min bersîv

da: 'xwijkên min, ji we bêtir çu kesek ii ber dilê min nîne, baj e, madem wisa ye, ser seran ser çavan.' Min ew ramûsan û em cardin wek berê li cem hev man.

119

Bi wê jêweyê salek borî. Wê gavê min xwe bi xwe got: Dê gelekî baj be ku ez bi kejtîyeke tije mal, seferê bilcim; ji bo bazirganiyê herim Bassorayê. Min ji xwijkên xwe pirsî lca ew dixwazin bi min re werin, an li malê bimînin û li xaniyê me miqate bin. Wan got: 'Em bi te re tên, bê te sebra me nayê, em nikarin tehamula nebûna te bikin.' Ew jî hatin, me bi hev re sefer kir. Lê berî ku em herin, min pereyên xwe kirin du bej, min bejek li malê danî, yê din bi xwe re bir; ez difikrîm: Li rê çî dibe çî nabe, mirov pêrgî qezayan dibe, an tijtek bi kejtîyê bê, qe nebe gava em bîn malê, bila hin pere hebin ku em karibin jê îstîfade bilcin.

Em roj li pey rojê, em jev û roj çûn; çî mixabin ku kaptên pusûla winda kir; jîpê em ber bi deryaya vekirî bir, em çûn dereke din; derveyî cihê ku me niyet kiribû. Li ber bayelcî bi hêz em mecbûr bûn bi rojan biçin. Li dawiyê, li dûr bajarekî xuya dilcir. Me ji kaptên pirsî ka ew çî bajar e; wî got: 'Bi xwedê ez nizanim. Çu car ez ne hatime van deveran. Lê herhal çî be jî, em ji talûkeyan rizgar bûn. Em berê kejtîyê didin bajêr, li wê derê, hûn bi ya min bilcin, heke hûn karibin malê xwe bifirojin.'

Pijtî saetekê ew hat; û wî got: 'Bilezînin. Ji kejtîyê dakevin; ji xwe re tijtên ecêb yên ku Xwedê afirandine bibînin; ji bîr nelcin, hertim navê Xwedê zilcir bikin da ku Ew, we ji qeda û

belayan biparêze.'

Em çûn, lê li bajêr em çî bibînîn. Ehlê bajêr bûbûn kevirên rej; li bazarê, li meydana malê ji zêr û zîv tije bû. Bi kêfxwejî em her yek bi hêlekê ve çûn; me bi qasî ku em karibin hildin, me zêr, zîv û caw da ser hev.

Ez bi xwe ber bi burcekê mejiyam; gava ez lê nêzîk bûm, min bala xwe dayê ew serayeke Mîr bû.

Şehrezadê dît ku hungura sibê ye ew bi dîqet bêdeng ma.

Lê di jeva nodemîn de wê domand:

120

Keçika ciwan ya yekemîn got:

"Ez bi xwe ber bi burcekê mejiyam; gava ez nêzîk bûm min bala xwe dayê ew serayeke Mîr bû. Ez di deriyekî ji zêrê som bihurîm; min perdeyeke mezin ji jîfon rakir û ketim hundirê odayekê ku bi mobîlyeyên ji zêr û zîv raxistî bû. Li eywanan, li bexçe, an rûniştî an li piyan nobedar û pêjkar û xulam hebûn; hemî bûbûn kevir, lê mirov digot qey zindî ne. Li eywana herî hindur, Mîr, cilên wî lê, -li derûdora wî wezîrên wî, qumandarên wî û xelkê serayê-, li ser textê xwe rûniştîbû; min ji çavên xwe bawer nedikir; ew jî bûbûn kevir. Li derûdor cilên ji hevrîjim li wan, pêncî muhafiz ku jûrê wan kêjayî, hebûn. Textê mîr bi mircan û mucewheran hatibû neqijandin; her mircanek wek stêrkekê diçurusiya Bi dîtina wê dîmenê ez gêj bûm. Ez mejiyam gîhajtîm eywana haremê. Her tijt ji zêr bû. Caxên ber pencereyan jî ji zêr bûn. Li dîwaran diba yên ji hevrîjim daliqandî bûn. Perdeyên jibake, pencere û deriyên ji hevrîjim bûn. Li nava wan

jinên ku bûbûn kevir, jinmîr rûnijtîbû. Kirasê wê bi mirca-
nên saf hatibû xemilandin, taca wê bi mucewheran neqijan-
dî; rêza eniyê, bi jêweyeke jahane hatibû xemilandin; çi heyf
ew jî bûbû kevirê rej.

Ez li serayê geriyam, ji odeyekê derbasî yeke din bûm; li
her cihê ez heyîrîm, mit û mat mam. Lê çi mixabin min çu
çirûskeke zindî nedît. Ez ewqas di bin tesîrê de mam ku min
sebebê hatina xwe, kejtî û xwijkên xwe ji bîr kirin. Gava
dunya bû tarî, min xwest ez vegerim, lê min riya vege-
rîm. Di dawiyê de ez hatim eywaneke mezin ku li nîva eywa-
nê textekî razanê ji mermer, li dora wî finddankên ji zêr ku
find tede bûn; hebû. Eywan bi tijtekî ku dibiriqî dihate ro-
nîkirin, min ji nêzîk ve mêze lîcîr, ew pirlantayek bû, bi qasî
hêkeke hêjtirmirîjkê hebû; ku ronahî jê der diçû. Ez li ser
textê razanê rûnijtim; min lihêfê reng jîn yê ji hevrîjîm ku bi
121

zîv û mircanan hatibû neqijandin li xwe pêça; Qurana pîroz
hilda, çend cihên ku min dixwest, ez hêz jê bigrim min
xwendin û min ji Xwedê re spas kir. Bi wê jêweyê ez veke-
tim û min hewl da, ku ez di xew re herim; lê xewa min nedi-
hat; heya derengê jê ez welê bêxew jiyar mam.

Ji nijkê ve min dengê bihîst: Dengê xwe jî nerm ku
Quran dixwend. Ez bi lez jî cihê xwe rabûm ber bi cihê ku
deng jê dihat çûm. Pijî ku min findek pêxist, ji bo ez pêjiya
xwe bibînim, ez ji deriyekê vekirî borîm. Min li derûdora
xwe mêze kir, min ferq kir ku ez li cûreyekê îbadetxaneyê
me; ku ji alî lembeyên ji camên kesk dihate ronîkirin. Li nî-

va eywanê secadeyek raxistîbû; li ser secadeyê mirovekî ciwan, pirr zeîf, berê wî li rojhelat bû, rûniştî, Quran bi dengê berz û rîtmîk dixwend. Ez gelekî ecêb mam, mit û matmayî, min meraq dikir ka gelo wî mirovî çawa karibûye ji qedera bajêr xwe rizgar bike. Ez pêjve çûm û min silav da wî; û got: 'Li min bibore, bi navê rastiya wê Qurana ku tu dixwînî, daxwaza min ew e ku tu bersîva pirsê min bidî.' Wî bi jêweyê saicin û nerm bersîva min da: 'Berî ku ez bersîva te bidim; ey xatûn, divê tu bêjî ka tu li vir li çi digerrî?' Min meseleya xwe ji wî re got; ew gelekî ecêb ma, pajê min ji wî, ew tijtên ecêb ku min li wî bajarî dîtibûn pirsî. Wî devê kitêba pîroz girt; ez dawetê rûniştinê lçirim. Ez çûm li cem wî rûniştim; min bala xwe dayê, ew mirov dijîbiya heyva çardehê; gewdê wî xweji lihev, rengê rûyê wî mîna xurmeyên teze û çermê canê wî mîna krîstal bû. Heyf ku min berê ew nedinasî; agirekî jewatê bi dilê min ket; û min got: 'Efendiyê min, de ka bersîva pirsê min bide.' Wî got: 'Ser seran û ser çavan' û dest pê kir.

'Xanima delal, zanibe ku ev bajarê bavê min e; mirov û tebayên wî li vî bajarî diman. Ew Mîrê ku te li ser textê mîr rûniştî û ew jinmîra ku te li hêla haremê dît; yên ku bûne

122

kevir dê û bavê min in. Herdu jî mecûsî bûn û wan ji Nardûn re îbadet dikir; bi agir û ronahiyê, bi tarî û germbûnê bawer bûn. Wan bi stêrkan sond dixwar.

Ew ji mêj ve bêzarok û kurdûnde bûn; gava ez çêbûm, bavê min êdî kal bû; ez bûm sebra dilê bavo. Wî bi jêweyê

herî baj ez perwerde kirim ku ji bilî bextewariyê min tijtekî din nedipa.

Di nav xizmetkarên serayê de jineke pîr hebû ku misilman bû; û ji Xwedê û resûlê Wî re îbadet dikir. Lê kesekî nedizani; ejkere wê jî wek dê û bavê min bawer dikir. Bavê min ji wê gelekî bawer bû. Wî ew wek nimûneyeke bajî û baweriyê didî û gelek xelat didan wê.

Wî bi baweriya pîrê nedizani; ji lewre wî kurê xwe spart wê û got: 'Vî lawikî perwerde bike û wî fêrî dînê me bike.' Pîrê, ez bi gorî dînê îslamê perwerde kirim. Ez fêrî qaîdeyên îslamê yên paqijiyê, cûreyên îbadetê kirim. Ez bi zimanê pêxember fêrî xwendina Quranê bûm. Pijî van tijtan wê got: Kurê min divê van tijtan tu ji bavê xwe re nebêjî, an na ew ê te bikuje.

Min ji kesî re negot. Bi midetekê pijî ku pîrê perwerdekirina min bi dawî ani, ew mir. Ez li ser baweriya xwe mam; min ji Xwedê û pêxember re îtaat dikir, lê ehlê bajêr her li ser riya xwe ya xurafe û tariyê bûn. Rojekê dengê azana muzînekî nexuyayî hat guhên herkesî: 'Ey rûniştvanên vî bajêr, nema ji agir û Nardûnê re îtaat bikin; berê dilê xwe bidin Xwedayê ezîm!'

Wê gavê rûniştvanên bajêr gelekî tirsyan û hatin cem bavê min, ji bavê min pirsîn: 'Ew dengê xof çî bû? Em ji tirsan di-kin bimirin.' Bavê min got: 'Guh nedin tijtên wisa, ne tirsin; li ser baweriya xwe ya berê bin.'

Wan ji dil, xwe bi gotinên bavê min ve zeliqand û îtaeta agirî re berdewam bûn. Lê pijî salekê ew deng cardin hat

bihîstin, herweha sala diduyan û sêyan jî. Lê wan, dev ji baweriya xwe ya çewt berneda. O sibeyekê ev tijt qewimî, xezeb li wan barî; ew, tevî hesp, hêstir, deve û heywanên xwe yên din bûn kevirên rej. Ji ber baweriya min ya rast û mûmîn, bi tenê ez neketim ber xezebê.

Ji wê rojê û vir de, ez li vir rûdinim; nimêj dikim, rojiyê digirim û Quranê dixwînim.

Lê, xanima delal, ez niha ji vê tenêbûnê gelekî aciz bûme.' Min got: 'Ax xortê ciwan, tu bi vê rêkûpêkiya xwe, ma tu naxwazî bi min re werî bajarê Bexdayê? Li wê derê tu dikarî mirovên zana û xwende, jêxên qedirbilind ku jerîetê û dîn baj dizanin; li cem wan, tu dikarî der heqê iahiyetê de zanîna xwe zêde bikî. Li gel ku ez ji rêzeke berz im û koleyên min çî jin çî mêr gelek hene jî, ez ê bibim koleya te. Ez bi kejtîyeke tije mal hatime vir, pijtî ku qederê berê me da vir; vaye min li vir te û bajarê te nasî. Wek tu dibînî qederê em gîhandin hev.'

Ji bo razîkirinê ez gelekî li ber wî geriyam heya ku li dawiyê wî got: 'Erê.' Bi wî awayî ez li ber piyên wî zilamî, di xew de çûm, bi dilekî germ û bextewar.

Roja dinê, serê sibê em rabûn û me dest bi komkirina mucewheran yên herî hêja kir, bi qasî ku me karibû hilgirta, me da ser hev. Li jêr em pêrgî koleyên min û kaptanê kejtîyê hatin; yên ku li min geriyabûn. Ew bi dîtina min gelekî kêfxwej bûn û ji min pirsîn ka ez li ku bûm. Min serpêhatiya xwe û tijtên ku xortê ciwan gotibû û sebebê kevirbûna rûnijtvanên bajêr ji wan re got; ew gelekî ecêb man û jaj bûn.

Lê heçî, xwijkên min in, gava wan ew xortê çeleng bi min re dît, tavil hesûdiyê bi wan girt; û dest bi fen û fûtan kirin. Em çûn kejtîyê, ez gelekî bextewar bûm; û bi hezkirina wî mirovî re bextewariya min her zêde dibû. Gava ba rabû, em bi rê ketin. xwijkên min, em rehet nehijtin, rojekê hatin û

124

gotin: 'Xwijka delal, tu ê vî zilamê ciwan çi bikî? Ev zilam çima bi me re ye?' Min bersîv da: 'Ez difikirim bi wî re bize-wicim.' Pajê ez rabûm çûm cem wî û min ji wî re got: 'Efên-diyê min, ez dixwazim bibim ya te, min red neke.' Wî got: 'Ser seran û ser çavan.' Min berê xwe da xwijkên xwe û got: 'Ez bi vî zilamî tenê qaîl im, razî me, bila tijtên min yên din ji we re bin.' Wan got: 'Çima na, pijtî ku tu welê dixwazî, me qebûl e.' Lê ruhê wan bi îxanet, fêsadî û xirabiyê tije bû. Li ber bayekî xwey me riya xwe domand, me deryaya tirsê li pey xwe hîjt, em hatin deryaya emnê; heya ku me ji dûr bajarê Bassora dît. Wê jevê me lenger avêt û em hemî raketin. Lê gava em raketîbûn; herdu xwijkên min bi min û wî zilamî girtin û avêtin nav avê. Ji ber ku wî xortê ciwan avjenî nedizanî, ew xeniqî; qeder; lê ez xilas bûm. Bi izna Xwedê min xwe bi textekî pehn ve zeliqand, li ber pêlan ez çûm pêrgî rejahiya giraveke dûr hatim. Min cilên xwe givajtin, zuha kirin. Roja pijtî wê, ez ber bi nava giravê mejiyam; li jiverêyekê min rêça piyên insanan dît. Şiverê ber bi beravajî cihê ku bajarê Bassora xuya dibû, diçû. Ji nijkê ve marekî rej û li dû wî marelcî mezin ku dixwest wî bikuje ber bi min ve hat. Dilê min bi marê rej jewitî; zimanê wî daketî tirqnefes

û westiyayî xuya fikir; min ji erdê rahijî kevirekî mezin û avêt ji serê mêr de, kevirê min li marê rej ket. Her di wê gavê de marê rej du bask vekirin û firiya çû; ez mit û mat mam.

Ez rûnijtim da ku bêhna xwe vedim, lê ji ber ku ez gelecî westiyabûm, ez di xewê re çûm; saetekê raketim. Gava jiyar bûm, min dît vaye rejikeke rind li ber piyên min rûnijtî; lingên min difirikîne. Min gelekî jerm kir, ji lewre min daxwaza wê fam kir; min ji wê pirsî lca ew çî dixwaze. Wê bersîv da: 'Ji ber ku te dijminê min yê mezin kujt ez bi lez û bez hatim vir. Ango ez ew marê rej im; ya ku te ji wî marê me-

125

zin rizgar kir. Ew marê mezin û ez, em herdu jî cin in; ew dijminê min bû, dixwest hi zorê tecawizê min bike û min bikuje. Gava te ez xilas lçirim, ez tavil firiyam çûm kejtîyê, cihê ku xwijkên te, te avitibûn avê. Min xwijkên te xistin bin sihrê û lçirin dêlik û vane li vir in.' Wê du segên ku bi darekê ve girêdayî bûn nîjan dan û got: 'Ew mucewherên ku li kejtîyê hebûn min hildan, birin, li xaniyê te yê ii Bexdayê danîn; pajê min kejtî jî xerq kir. Ew xortê ciwan mirî ye û li hember mirinê tijtek ji destê min nayê, her tijt ancax ji destê Xwedê tê.'

Bi van gotinan re, wê herdu seg -xwijkên min- ji darê vekirin, em her sê jî xistin hembêza xwe, firiya, anî, em li ser banê xaniyê min, li Bexdayê danîn.

Ez daketim jêr, li nav malê geriyam; belê, ew hemî mucewher û tijtên din ku li kejtîyê, me bi cih kiribû, bi jêweye-

ke têtûz, bêî çu kêmasî û xisarê di hundirê malê de bûn. Wê gavê wê jinika cin ji min re got: 'Ez ê bi tijtekî te bê-huzûr bihêlim; bi mora Hz. Suleymanî divê tu rojê sêsed qamçiyên li van herdu segan bidî. Heke tu bi rojekê tenê jî ji bîr bikî, ez ê bi firîn werim te jî wek wan biguherim bikim dêiik;

Ez mecbûr mam ku bersîva wê bidim: 'Baj e, ser seran û ser çavan.'

Ji wê rojê û vir de, ez xulam, ey melîkê mumînan, ez mecbûr im da ku bi qamçiyê li wan bixim, ji ber ku dilê min bi wan dijewite ez digirîm û wan hembêz dilcim.

Ev e, çîrolca min!"

Di wê lehzeyê de Şehrezadê dît ku hungura sibê ye; ew bi îtîna bêdeng ma.

Lê di jeva nod û pêncemîn de wê got:

Keçika ciwan ya yekemîn weha gotibû:

" Ji wê rojê û vir de, ez xulam, ey melîkê mumînan, ez

126

mecbûr im ku bi qamçiyê li wan bixim, ji ber ku dilê min bi wan dijewite ez digirîm û wan hembêz dilcim.

Ev e, çîroka min!

Ey hukumdarê mumînan, vaye xwijka min Amîna li vir e; ew dikare çîroka xwe, ya, ji ya min ecêbtir bêje."

Xelîfe Harûn el-Rajîd, bi bihîstina van gotinan re gelekî heyirî; ji ber ku pirr meraq dikir, hema bêwestan berê xwe da keçilca ku jeva berê ji wan re derî vekiribû, Amînayê û pirsî: "Keçika spehî, ew cihên lêdanan li lajê te çî ne, çî pê

hatiye?"

Bi pirsax Xelîfeyî re Amîna pêj ve hat û dest pê kir:

Çîroka keçîka ciwan ya duyemîn

"Ey hikumdarê mumînan, ne hewce ye ku ez gotinên Zubeyda yê der heqê dê û bavê me de dubare bilcim. Pijtî mirina bavê me, ez û xwijka xwe ya herî piçûk Fahîma li cem diya xwe; Zubeyda û xwijkên xwe jî li cem diya xwe man, jiyân.

Pijtî demekê diya min ez bi zilamekî kal re ku wê gavê herî dewlemendê bajêr bû, zewicandim. Pijtî salek zewaca me, mêrê min, bi qedera Xwedê, mir û ji min re bi bihayê hejtê hezar dînar zêr ma. Min heba wan bi hezar dînarî deh kirasên giranbiha lîcîrîn û min xwe jî tijtekî mehrûm nehêla.

Rojekê ez ii malê kêfxwej û rûniştî bûm; pîrek hat cem min. Ew pîr pîr zîjt bû, min di jiyana xwe de yeke welê zîjt nedîbû: Rûyê wê mîna dareke kevnar qermîçî, bêvileke jîkestî ku hertim çilm jê dihat; diranên jîkestî, çavên wê mîna fahîjeyeke pîr, stuyekî xwaro maro, wê silav da û got:

'Ey xanima spehî û delal; li cem min, keçikeke bê dê û bav ku dê îjev bizewice, heye. Ez ji te rica dikim da ku tu werî

127

daweta wê belengazê; ji ber ku ew li vir kesî nas nake.' Bi van gotinan re pîrê dest bi girînê kir, xwe avêt piyên min; min bi xirabiya wê nedizanî, loma jî dilê min pê jewitî û min got:

'Baj e, ser seran û ser çavan.' Wê dom kir: 'Bi izna te be ez dê niha herim, da ku bi bêhnfirehî tu cilên xwe li xwe bikî; ez ê êvarê werim te bibim.' Wê destê min ramûsa û ew çû.

Ez rabûm çûm hemamê, min di ava bi parfum de xwe jûjt. Min kirasekî ji yên nuh û herî biha li xwe kir; min xwe bi gerdan, bazin û guharên herî spehî xemiland; serpûjekê rengjîn ji hevrîjim ku dora wê bi pelikên zêr hatibû neqijkirin hilda û kembereke xemlê girê da. Êvarê pîrejin hat; da ku min bibe, min gazî çend koleyên jin, yên xwe, lçir da ku ew jî bi min re werin; em bi rê ketin, çûn heya em gîhajtîn ber deriyekî bilind ji mermen em ketin serayeke berz ku ser banê wê digehajt nav ewran. Di qorîdoreke dirêj re em derbas bûn; ku dîwarên wê cîlakirî û herweha, perdekirî û bi zêr, mucewher, çekên giranbiha xemilandî bûn; heya em hatin eywaneke welê mukemel ku ne mimkun e mirov lcaribe salix bide.

Li nîvê eywanê, textekî razanê ji mermer ku bi mircan û mucewheran neqijkirî û ji hevrîjim xemilandî û herweha bi perdeyên hevrijimî dor lê pêçayî hebû.

Perde hatin hilanîn(ji kêlekê ve hatin kêjan); keçikeke spehî wek heyva çardehê xuya bû. Wê ji dil bixêrhatin li me kir û cihê rûnijtinê nîjanê me da û got: 'Ey xwijka min, birayekî min ku wî carekê, li dawetekê te ditiye, heye. Xortekî ciwan û çeleng e; û ji min gelecî xwejiktir re. Ji wê rojê û vir ve dilê wî ketiye te û bi agirê evînê dijewite. Wî gelek pere dan pîrejinê da ku ew te bîne vir. Ji bilî ku bi te re bizewice wî çu niyeteke din nîne; di vê sala Xwedê û resûlê Wî ya pîroz de, ev tijt ne jerm e; berevajî caîz e.'

Min ferq kir ku di wê serayê de ew keçik xwediyê cihekî

bilind e; min got: 'Baj e, ser seran û ser çavan.' Ew pirr kêfxwey bû, destê xwe li hev xistin; derî vebû û xortekî ciwan wek heyvekê hat hundir. Wî bi dilekî têr evîn, bi carekê dil ji min bir; ew çû cem xwijka xwe rûniyt, pajê qadî tevî jahidan hat; mehra min bi wî xortê ciwan re birî; jahidan kaxez mor kir û pajê hemî ji eywanê derketin, çûn.

Wê gavê ew xortê ciwan rabû, hat cem min û got: 'Bi hêviya jeveke xwey ya xêrê. Lê, delaia min, ez mecbûr im, jertekî li ber te deynim.' Min got: 'Bêje, ka jertê te çi ye?' Wî çû kitêba pîroz anî û got: 'Divê tu bi vê kitêba pîroz sond bixwî da ku ji bilî min, tu li kesekî din mêze nalcî; te kesekî din navê.' Min sond xwar. Wê gavê ew gelekî kêfxwey bû. Ez hembêz lçirim; bi wê yekê re min his kir ku çawa dil û ruhê min bi evînê tije bû.

Pajê xulaman, xwarin û vexwarin anîn; me têra xwe xwar û vexwar. Bi jev heya sibeyê em di hembêza hev de man. Mehekê tamam, bi wê jêweyê di nav kêf û zewqê de em jiyayn. Rojekê min ji mêrê xwe daxwaz kir da ku izinê bide min, ez herim bazarê û çend cûre cawan bikirim; wî izin da min, got 'baj e'. Min cilên xwe li xwe kirin, tevî pîrejinê ku li serayê dima, em çûn bazarê. Bi jîreta pîrejinê em li ber dukanekê hevrîjîmfiroj sekinîn. Xwediyê dulcanê zilamekî ciwan bû. Pîrejinê got 'ez wî ji zûde nas dikim' û lê zêde kir: 'Bavê wî gelek mîras ji kurê xwe re hijt.' O pîrê ji xortê dukandar re got: 'Ka cawên xwe yên herî biha û spehî bîne, em bibînin. Ji bo vê xanima rind û delal e.' Wî bersîv da: 'Ser seran û ser çavan.' Gava wî xortî cawên xwe li ber me radixistin, pîrejinê her pesnê wî dida. Lê min got: 'Qencî û têtûzi-

ya wî, an jî gotinên te min eleqeder nalcin; em hatine caw bi-
kirin û vegerin malê.'

Gava me cawên ku min ê bikiriya hîlbijartin, min derxist
pere dirêjî wî kir; lê wî înat kir û got: 'Ez îro pere ji we nagi-
129

rim; ji bo min kêfxwejî û jeref e ku ez van cawan wek xelatê
didim we.' Wê gavê min ji pîrejinê re got: 'Pijî ku ew peran
nagire, cawên wî paj ve bide wî.' Lê dukandarî got: 'Bi Xwe-
dê, ez peran ji we bastînim. Ev caw ji hêla min diyarî ne. Lê,
xanima spehî, ji dêl pere ve tu maçekê bide min, tenê maçe-
kê. Ew ramûsan dê ji bo min ji hemî tijtên ku li dukana min
in, hêjatir be.' Pîrejin kenîya û wê got: 'Xortê ciwan, xuyaye
tu ne zêde bi aqil î; ku tu qedrê ramûsanekê ewqas bilind di-
girî; û tu qîza min, ne tirs e; çu xirabî çênabe heke tu ji dêl
van cawên biha û spehî, maçekê bidî.' Min got: 'Ma tu niza-
nî ku min sond xwariye?' Wê dubare lçir: 'Heke bêî ku tu
xwe bilivînî, ew te ramûse, ne hewce ye tu xwe sûcdar bikî;
wê gavê him caw him jî pere ji te re dimînin.' Bi wî awayî
pîrê navbeynî kir û li dawiyê min daxwaza wî qebûl kir. Min
destê xwe da ber çavên xwe, serpûja xwe ralcir da ku keselçî
din nebîne. Wî xortê ciwan serê xwe xist bin serpûjê, lêvên
xwe ber bi hinarika min bir û ji hinarikê ez ramûsam. Her di
wê gavê de -bi ramûsanê re- wî welê dev li hinarika min kir
ku ez ji ber êj û liberxweketinê ji xwe çûm.

Gava ez jiyar bûm -hatim ser hijê xwe-, dulcan girtî, xortê
ciwan winda û serê min li ser çolca pîrejinê bû. Ji ber rewja
min pîrê gelekî xemgîn bû û got: 'Spas ji Xwedê re ku em ji

belayeke mezintir parast. Niha divê em herin malê, ez ê mel-hemekê ku tavil birînê sax dike, tê bidim.' Ez tavil ji cihê xwe rabûm û me berê xwe da malê; bi nêzîkbûyîna malê ve, ez li tijtên ku dê bên serê min fikirîm; wê fikrê ez bêhuzûr dikirim.

Ez hatim malê, çûm odeya xwe, wek ku nexwej bim. Lê mêrê min, bê xem hat hundir û pirsî: 'Ax, xanima delal, bi gera we re çi bela hatiye serê te?' Min got: 'Ne tijtekî. Ez sax û selamet im.' Wî bi dîqet li min mêze kir û pirsî: 'Lê, ew birîna, li cihê herî xwejik û nazik, li rûyê te çi ye?' Min got:

130

Gava ez bi izna te çûm bazarê; li kolaneke teng deveyeke êzing barkirî hat, ji tengbûna kolanê êzingekî serpûja min qetand û rûyê min bi birîn kir. Wek tu dizanî, kolanên Bexdayê teng in.' Wê gavê ew gelekî qeherî; wî got: 'Sibeyê ez ê herim cem walî, gilî bilcim ku tevê deveajoyan û êzingfirojan bi dar de bike.' Dilê min bi wan jewitî û min got: 'Guh ne-de vê yekê. Bi rastî xeletiya min bû, ez li kerekî siwar bûm, ker beziya û ez ketim erdê û bêhemdê xwe ez li êzingekî ketim ku rûyê min çirand.' Wê gavê ew qêriya: 'Sibeyê ez ê herim cem Gafar el-Barmakî, meseleyê ji wî re bêjim da ku hemî kerajoyên li bajêr bi dar de bike.' Lê ez aciz bûm, min bi qêrîn got: 'Te xêr e, ma tu dixwazî ji bo xatirê min dunyayê xera bikî? Ev tijt bi daxwaza Xwedê qewimî ye; di qedera min de welê nivisiye.' Wî nema xwe ragirt û got: 'Tu, jinika bê îman; bes derewan bike; tu yê bedêla sûcê xwe bibînî.' Wî gotinên giran ji min re gotin; li min heqaret kir, piyên xwe li

erdê xistin û bangê heft heb rejikên mîna cinawiran kir; rejikan ez ji nav nivînan rakirim; û ez di erdê re kijandim, birim hewjê. Rejikekî bi milê min girt, yekî din ii ser çokên min rûnijt; yekî sêyemîn di destê wî de jûrek hat û got: 'Ey efendî, ez wê bilcim du qet?' Rejikekî din lê zêde kir: 'Em lajê wê parçe parçe jêkin û biavêjin çemê Dicleyê ji bo masiyan. Divê cezaya yên ku li ser soza xwe û zewacê namînin, ev be.' Wê gavê mêrê min, ji rejikê re, yê ku jûr di destê wî de bû re, got: 'Belê, Saadê jîrek, wê jinikê bike du qet!' Û Saadê jûr rakir, mêrê min got: 'Kelîmeya jehadetê bîne, navê tijtên ku yên te ne bêje, wesiyeta xwe bike, ji lewre dawiya jiyana te ye.' Lê min got: 'Ey ebdê Xwedê, ez ji te piçek wext rica dilcim; da ku ez karibim jehadeta xwe bînim; û wesiyeta xwe hazir bikim.' Min li asîman mêze kir. gava ez li wê rewja xwe ya xirab û nazik difikirîm, ji çavên min rondik mîna baranê dihatin.

131

Lê, her di wê gavê de, pîrejin hat derve, xwe avêt piyên xortê ciwan, ew ramûsan û got: 'Kurê min, ez dayeya te me, ez ji te rica dikim tu vê jinikê bibexjînî. Ji ber ku wê sûcekî ku vê cezayê heq dike nekiriye. Herweha tu hîn xort î, ez ditirsim ku laneta wê te biêjîn.' Pîrê rica û lavaya xwe bi girînê domand; heya ku mêrê min li dawiyê got: 'Baj e, ji bo xatirê te, ez wê nadim kujtinê. Lê ez ê wisa nîjanekê di lajê wê de çêkim ku heya ew sax be, ew nîjan lê be.'

Pajê wî emir da rejikari, wan, cilên min ji min kirin; ez çîp oryan tazî hîjtim. Wî qamçiyek hilda û bi wê li lajê min xist.

Bi teybetî li pijta min, sînga min û kêlekên min dixist; ji ber êjê ez bêhij ketim erdê. Min digot qey ez dimirim. Wî bi wê jêweyê ez li erdê hîjtim û emir da koleyan da ku pijtî ku tariyê erd hilçinî, min hildin, bibin wek tijtekî mirî biavêjin hundirê xaniyê min yê berê.

Gava ez jixweçûyînê jiyar bûm, ji ber êj û birînan min nedikarî ez xwe bilivînim. Bi dermanên cûrbicûr min birînen xwe derman kirin; birîn rehet bûn, lê jûna wan xuya dikir; ku jûna wan we hemiyar duhî dît.

Pijtî çar mehan, ez baj bûbûm û êdî min dilcarî ez rabim, bimejim. Ez çûm seraya ku min ezab lê dîbû. Lê seray û tevî derûdor wêran bûbû; di jûna wan zêr û mucewheran, gil û gemar li ser hev bû. Li gel ku min der heqê mêrê xwe de gelek lêkolîn jî lçir, lê min çu zanîn bi dest nexist.

Ez vegeyriyam cem xwijka xwe ya herî piçûk, Fahîma ku hîn jî destlêneketî û qîz e; em bi hev re çûn cem nîvxwijka xwe Zubeydayê, ya ku serpehatiya xwe û herdu xwijkên ku bûne seg ji we re got. Pijtî silav û bixêrhatinên germ me meseleyên xwe ji hev re gotin. xwijka min Zubeydayê got: 'xwijkên delal, çu kesek nikare xwe ji qedera xwe xilas bike; jukir ji Xwedê re ku hîn em dijîn. Fermo em li cem hev rojên xwe yê mayîn bi hev re biborînin, bijîn. O berî her tijtî

132

divê gotina zewacê ji vir pê ve neyê gotin; divê vê gotinê bi tamamî em ji bîr bikin.'

Xwijlca me ya herî piçûk jî li cem me ma. Ya ku her roj diçe bazarê û tijtên pêwist dikire ew e. Wazifeya min derî vekî-

rin û li mêvanan bixêrhatin kirin e. Xwijka min Zubeyda jî mazûbana malê ye.

Em bi wê jêweyê bi bextewarî, bêmêr dijiyan, heya roja ku hemalekî tevî tijtên ku xwijka me kirîbû, bi xwijka me Fahîmayê re hat malê û me izna wî da, da ku bêhna xwe vede. Pajê ew her sê parsek û pajê hûn yên din bi kincên bazirgan hatin. Niha tu her tijtî dizanî; ey mîrê mumînan. Ev e çîroka min.'

Wê gavê Xelîfê gelecî ecêb ma û. . .

Di wê gavê de Şehrezadê dît ku hungura sibe ye û bi îtîna bêdeng ma.

Lê gava jeva sedemîn hat, wê got:

Ey Mîrê bextewar, min bihîstiye ku Harûn el-Rajîd ew çîrokên ku dibihîst, ji ber ecêbiya wan mit û mat dima; û wî emir da nivîskarên resmî da ku wan çîrokan binivîsin û li arjîva dewletê bîn parastin.

Pajê wî ji Zubeydayê re got:

"De ka ji min re bêje, xanima bi esil, ma te tijtekî ji wê cinê ya ku xwijkên te bi sihrê lçirin dêlik, nebihîstiye?' Zubeydayê bersîv da: 'Belê, mîrê mumînan, berî ku em ji hev biqetin, wê guliyek ji porê xwe da min; û got gava ez bixwazim wê bibînim, divê ez tayelcî ji wî guliyê bijewitînim; wê gavê ew ê tavil were, heke ew li pey çiyayê Qafê be jî.'" Wê gavê Xelîfeyî got: "Ka wî guliyê bide min." Zubeydayê ew gulî dirêjî Xelîfeyî kir, wî tayek jê lçijand û jewitand. Berî ku bêhna jewata tayê por here wan, tamamê serayê hejiya; û cin di jiklê keçikeke ciwan û qedirberz de xuya bû. Ji ber ku ew misilman bû, wê silav da Xelîfeyî û weha got: "Xwejî û bextewarî

para we be,-selamualeykum- ey Xelîfeyê Xwedê." Xelîfeyî got: "Aleykumeselam we rehmetullahî berekatuhû." Pajê wê got: "Hukumdarê mumînan, tu zanibe ku vê jina ciwan, ku li ser daxwaza te gazî min kiriye, wê qenciyeke hêja bi min lciriye, tovê qencyê di ruhê min de çandiyê; ez çî bikim jî ji bin qenciya wê nikarim rabim. Min xwijkên wê kirin dêlik, heke min ew nekujtin, ji ber ku min nexwest ev keçilca ciwan xemgîn bibe. Heke tu bixwazî da ku ez wan ji sihrê rizgar bikim, ez ê ji bo xatirê te û xwijka wan vî karî bikim. Herweha ez ji bîr nakim ku ez misilman im." Xelîfeyî got: "Belê, ez dixwazim ku tu wan rizgar bikî! Pajê em ê li rewja vê keçika ciwan ku bi qamçiyên li wê dane, binêrin. Heke wek ew dibêje rast derkeve, ez ê wî mirovê ku wisa lciriye bidim peyda kirin û ceza bilcim." Wê gavê cinê got: "Ey hukumdarê mumînan, ez ê hinek pajê ji te re bêjim ka lcî welê bi Amînayê kiriye; bi wê re zewiciye, dest daye ser hemî tijtên wê, lê tu zanibe ku ew ji temamê insanan bêtir nêzîkî te »

ye.

Pajê cinê taseke av hilda û hin tijt lê xwendin. Wê av li wan herdu dêlikan rejand û got: 'Tavil bikevin jiklê insanan!' Ew tavil ketin jiklê jinên spehî û ciwan ku ji Xwedê re jukir kirin.

Cinê berê xwe da Xelîfeyî û got: "Yê ku welê zilm li Amînayê lciriye kurê te el-Amîn bi xwe ye." Wê temamê çîrokê ji Xelîfeyî re got; bi wî awayî Xelîfeyî ji devê cinekê jî çîrok

guhdarî kir.

Wê gavê Xelîfe gelekî ecêb ma û wî got: "jukir ji Xwedê re ku ev herdu seg bi saya te rizgar bûn." Pajê wî jand pey kurê xwe el-Amîn û emir da wî da ku meseleyê bêje; el-Amîn çîrok hemî got. Xelîfeyî jand pey qadî û jahidan û ew hemî di eywanê de, ango ew her sê parsek-kurê mîran-, her sê jinên ciwan û herdu xwijkên sihêrkirî, hazirbûn.

134

Li pêj qadî û jahidan Xelîfeyî kurê xwe bi Amînayê re zewicand; û Zubeyda û herdu xwijkên wê bi wan her sê kurê mîran re zewicandin. Xelîfe bi xwe jî bi keçika herî piçûk ya ji wan pênc xwijkan, ya herî jêrîn û spehî re zewicî ku hîn qizbu.

Xelîfeyî, ji bo jin û mêrelcî, her cotelcî, qesrek da avakirin û gelecî pere û diyarî li wan bexijandin da ku ew dilxwey û bextewar bijîn. Gava êvar hat; wî bi lez xwe gîhand hembêza Fahîma ya ciwan; jeveke jêrîn û xwey bi wê re borand.

Dawî

Pijtî ku Şehrezadê ev çîrok xilas kir, ew bêdeng ma.

Lê Mîr Şahriyar got: "Axx Şehrezad, çî çîrokeke hêja! Te bi gotinên bijarte û hêja ji min re fersend çêkir ku ez karibim seipêhatî û jiyana mîr û xelkên welatên din, yên zemanê berê û niha bibihîzim; û gelek ji wan bi rastî jî nadîr û hêjayî lêfikirê bûn. Bi guhdarîkirina te ya hezar û yek jevê, ez hatime guhertin û bûme insanekî din; niha dilê min ji bo jiyane bi bextewarî lê dide û bi bextewariyê tije bûye. Qîza wezîrê min ya pîroz, jilcir ji Xwedê re ku Wî te jiyand. Ewqas diya-

riyên hêja bi gotinên te yên xwe jî hêja, wek ku di hingiv de bêt dakirin, di eniya te de bi cih bûne jî hîjê te xurttir lîcî-

»

ne.

Dinyazada piçûk jî cîyê xwe rabû, çû xwîjca xwe hembêz lîcî, piyên xwe li stoyê wê pêçan jî got: "Ooo Şehrezad, xwîjka min ya delal, tu çîrokan çî bi jêweyeke xwe jî, qenc jî hêja dibêjî!"

Şehrezadê piçêkî serê xwe xwar kir; xwîjka xwe ramûsa jî bi dengêkî gelecî nizim çend gotin di guhê wê de gotin. Keçîlca piçûk rabû, çû. Şehrezad mideteke kurt bi Mîr re tenê

ma. Wê gavê wî destên xwe dirêjî wê lîcîrin jî xwest bi dilxwejî wê hembêz bike; lê gava wî, Dinyazad tevî dayînekê ku du zaro li hembêza wê jî yek jî li pey wê bi papûlçkanî dihat, dît; wî xwe ragirt.

Şehrezadê bi bijêrînê berê xwe da Mîr Şahriyan ew her sê zaro xistin hembêza xwe; nîjanê wî dan jî çavên wê tije ronîk, wê got: "Ey Mîrê zemanan, Xwedê ev her sê zaro di mideta sê salan de, bi alîkariya min, dan te."

Gava bi bextewariyeke mezin jî nedîtî Mîr Şahriyar xwe xwar kir da ku zaroyan ramûse, Şehrezadê axaftina xwe domand: "Kurê te yê mezin du salên xwe tije lîcîrine lê yên cotîk(hevalza) yek salî ne. Mîmlîcin e bê bîra te jî ku di navbeyna jêva jêsed jî heftê jî nehan jî ya heftsedî de, ez çend hefte ne musaît bûm. Her wê gavê bû ku cotîk jî min re çêbûn; jî ez gelekî pê westiyam, ango salekê berê gava jî min re kur çê-

bû ez ewqas newestiyabûm; ji lewre min çîrok gotina xwe qut nekiribû."

Ew bêdeng ma; û Mîr Şahriyar berê xwe da zaroyan, ew gelekî di bin tesîrê de mabû. Ji lewre wî nekarî tijtekî bêje. Lê keçika ciwan Dinyazad, ya ku ji ramûsana zaroyan nedwestiya, berê xwe da Mîr jahroyarî û got: "Ey Mîrê zemanan, tu niha difikirî ku serê xwijka min Şehrezadê jê bikî û van zaroyan bê dê bihêlî û herweha wan ji heskirina dayîkê mehrûm bilcî?"

Şahriyarî kelogirî weha got: "Hus be, bêdeng be keçê!" Gava wî xwe ragirt û bû hakimê hestên xwe, wî berê xwe da Şehrezadê û got: "Axx Şehrezad, berî ku zaro bên dinyayê jî te dil ji min biribû. Te dizanî û tu têgihîjtibû ku bi xusûsiyetên ku Avakar te bi çek kiribû; min ji dil ji te hez kir; wek jineke bi hemî awayî balcîre, ya pak û delal, yareke bi îflêt, jîr û bawerdar; xwejbêj û bi tedbîr, bi kêf û aqil. Xwedê ji te, ji bavê te, diya te, malbata te û sulala te razî be."

136

Wî xwe xwar

û serê wê ramûsa. Lê Şehrezadê bi destê

icir

wî girt, bir ber lêvên xwe, bir ber sînga xwe û pajê bir eniya xwe û got: "Ey Mîrê zemanan, ez ji te tika dikim ku tu gazî wezîrê xwe bilcî da ku ji bo xatirê min dilê wî gejbibe û fersend jê re çêbe ku di vê jeva pîroz de piçekî kêfxwejbibe."

Mîr tavil xeber jande pey wezîrê xwe; wezîr, li ser piyê wî kefenê qîza wî û bawer dikir ku tijtê di qederê de nivisiye

der heqê qîza wî de her pêk tê, hat. Mîr Şahriyar eniya wî ramûsa û got: "Xwedê qîza te ji bo felata xelkê min jandiye; bi saya wê di dilê min de pojmanî peyda bû." Bavê Şehrezadê wisa ecêb ma ku tavil ji xwe çû û ket erdê; kesên hazir li dora wî civiyan, gulav li rûyê wî rejandin û ew jiyar kirin. Şehrezad û Dinyazadê destê wî ramûsan; wî jî ew pîroz kirin û bi kêfxwejî jeva xwe borandin.

Mîr Şehriyarî qasidekî xwe jand cem birayê xwe Şahzemanî, Mîrê Samarkand el-Acamê û pajê bi xwe jî ji bo bixêrtinê bi awayekî qedirbilind pêjwazî li birayê xwe kir. Bajar ji bo kêfxwejiyê hate xemilandin; misk û ember li nav bajêr hate rejandin. Bajariyan destên xwe hine lçirin; û safran li rûyê xwe dan; dengê saz, kilarînet, bilûr, zîl û defikan ji çar aliyên ve bilind dibû.

Li temamê bajêr mîhrecan hate bidarxistin û hemî mesref ji xezîneya Mîr Şahriyarbû; xelkê di nav kêf û xwejiyê de, ew roj pîroz dikir. Mîr Şahriyar serpêhatiya xwe, ango ew sê salên ku bi Şehrezadê re derbas kiribû; temamê bûyerê ji serî heta bi dawiyê ji birayê xwe re got. Herweha wî ew tijtên ku bi saya çîrokên Şehrezadê hînbû bû û bihîstibû ji Şahzemanî re gotin. Wî behsa xwejikî, jîrî, xwejgoyî, dilpakî, dostanî, paqijî û hemî ew xelatên hêja yên ku Xwedê Şehrezad pê xemilandibû lçirin. Dawiyê wî got: "Niha ew jina min ya helal û diya zaroyên min e."

Mîr Şahzeman gelekî ecêb ma û ji Mîr Şahriyar re got:

137

"Heke welê ye, ez jî dixwazim bizewicim. Ez xwijka Şehreza-

dê ya ku ez navê wê nizanim, bi helalî(jinîti) qebûl dikim. Wê gavê em dibin hevlingên hev, wek ku em birayên hev in. Bi coteke xanimên pêbawer, pak û delal; em dê kul û êjên xwe yên kevin ji bîr bilcin. Heke min ferq nekiriba, tu dê bi tijtekî nehesibaya. Axx birayê min bi rastî ev her sê salên dawî rewja min pirr xirab bû. Bi dilekî xwe j û rahet min nedilcarî tehma evîne û xwejiyên wê bibînim. Wekî te ez jî her jev bi keçikeke bakîre re radizam û min pajê ew dikujt; û bi wî awayî min ji hemî jinan tol digirt. Lê niha ez jî dixwazim bidim ser jopa te û bi qîza wezîrê te ya din re bizewicim." Gava Mîr Şahriyar ev tijt bihîstin gelekî kêfxwe j bû. Rabû, çû cem jina xwe Şehrezadê û jê re got ku birayê wî qerar daye û dixwaze bi Dinyazadê re bizewice.

Şehrezadê got: "Erê baj e, lê belê bi jertê ku birayê te Şahzeman jî bê vir û li cem me bimîne. Ji ber ku bê wê -Dinyazadê- ez nikarim saetekê jî bimînim. Heke birayê te bi vî jertî razî be, ji niha ve xwijka min xulama wî ye. An na çêna-be."

Mîr Şahriyar bersîva Şehrezadê gîhand birayê xwe Şahzemanî. Şahzemanî got: "Bi Xwedê, birawo, her ez jî wisa fikirîm. Ji lewre ez bi xwe jî ji te cuda nema karim bijîm. Heçî Mîrîtiya Samarkandê ye, Xwedê kî layîq dibîne bila ew bibe mîr. Ez nema vedigerim wir, ez li vir dimînim."

O Mîr Şahriyar got: "jîkur ji Xwedê re ku pijtî demeke dirêj, careke din me digehîne hev."

Pajê wî xeber jand pey qadî û jahidan; mehra Şahzeman û Dinyazadê hate birîn. Bi wî awayî herdu bira bi herdu xwijcan re zewicîn.

Şahî û kêfxwejiyê çil roj li temamê bajêr ajot û mesref hemî ji xezîneya Şahriyar bû.

138

Herdu bira û herdu xwijkan berê xwe dan hemamê; xwe bi gulav, avakulîlkan û ava miskê jûjtin.

Şehrezadê porê xwijka xwe jeh kir û guliyên wê hunan û bi mircanan xemilandin. Wê fistanekî bi zêr neqijkirî ku ca-wê fistan ji dema Xusrew mabû û bi jiklên çûk û heywanên xwejik hatibû neqijandin, li wê lîcir. Gerdeniyeke efsanewî xist stoyê wê; li ber destên xwijka xwe, Dinyazad welê bû spehî ku beriya wê, spehitiyeke wisa çu jinekê nedîtibû. Gava herdu Mîr ji hemamê hatin der û her yek ji wan li ser textê xwe yê hazirkirî rûnijt; herweha li milê çepê û rastê textên mîran, li du rêzan jinên giregirên weiêt, cihên xwe girtin. Wê gavê herdu xwijk di çengên hev de, bi hev re ketin hundir ku bi spehîtiya xwe dijibiyar heyva çardehê.

Jinekê ji yên hazir ku ji rêza herî qedirbilind bû, pêjve, ber bi Dinyazadê ve, çû; cilên wê ji wê kirin û fistanekî pirr xwejik, reng jîn î ji hevrîjim li wê kir. Mêrê wê Mîr Şahzeman ji cihê xwe rabû, hat bi heyranî ew eciband û careke din çu li ser textê xwe rûnijt. Ev îşareta wê yekê bû ku dê careke din cilên wê bihatana guhertin. Bi alîkariya xanimên hazir Şehrezadê fistanekî hevrîjîmî, di rengê qeysiyan de, li wê kir; ew ramûsa, bi destê wê girt û ew bir cem Mîr. Mîr rabû ser xwe, ji çar aliyan ve li destgirtiya xwe mêze lîcir û pajê li cihê xwe rûnijt. Şehrezadê fistanê di rengê qeysiyan de(rengêqeysî), ji xwijlca xwe danî û fistanekî sorî di rengê henaran de, yê jî-

fon li wê kir û bi destê wê girt; û hêdî hêdî li eywanê ew gerand da ku herkes wê bibîne û heyraniya xwe nîjan bide. Pa-jê careke din fistanê wê hate guhertin; ji hevrîjim, reng zer î wek rengê lîmonan yelcî xet xetî ii wê lçirin; dawiyê fistanekî kesk î hevrîjimî ku bi zêr û mircanan hatibû xemilandin û neqijkirin li wê kirin. Şehrezadê jixreyeke ku bi zumrutan hatibû xemilandin li eniya wê pêça; ket piyê wê, di nav rêzên xanimên qedirbilind re deras lçin di ber herdu mîran re bi-139

hurîn çûn eywaneke li hêla hundir. Li wê derê Şehrezadê çilên wê danîn. Ew hazir lçir û li ser textê razanê vezeland û tijtên pêwist jê re gotin. Wê, ew bi girîn ramûsa, ji ber ku ev jeva ewil bû ku ew ji hev diqetiyen; Dinyazad jî giriya. Lê, wan dê sibeyê hev bidîtana; ji lewre midetê bêrîkirina wan dê wextekî kurt baya.

O ew jev ji bo herdu birayan û herdu xwijkan bû jeva kêfxweji û bextewariyê û jeveke muhtejem ku pijtî wan hezar û yek jevê dihat; herweha ji bo jênîyên bajarê Şahriyarî dibû destpêka demeke nuh.

Serê sibeyê, pijtî çûyîna hemamê, herdu bira çûn cem xwijkan, gava ew hemî li cem hev bûn, wezîr, bavê Şehrezad û Dinyazadê hat cem wan. Mîr ji bo bixêrhatinê rabûn ser xwe û qîzên wî ji bo destramûsanê çûn pêjiya bavê xwe. Wezîrî ji herdu zavayên xwe re jiyanekê xweji û bextewar daxwaz kir û pîrsa fermanên Mîr ji bo wê rojê lçir.

Lê mîran got: "Axx bavo, ji vir pê ve em dixwazin tu emir bidî, neku emir bigirî. Ji lewre me bi hev re biryar daye ku

tu bibî mîrê Samarkand el-Acamê." O Şahzemanî lê zêde kir: "Belê, min dev ji Mîrîtiya wê derê berdaye." Lê Şahriyar ji birayê xwe re got: "Lê bi jertê ku tu di îdareya welêt de alîlcariya min bikî û bibî jirîkê Mîrîtiya textê min û rojek ez, yek tu divê em karûbarê welêt bi rê ve bibin." Şahzemanî got: "Ser seran û ser çavan!"

O niha ji kêfxwejiyê, herdu xwijkan bavê xwe hembêz lici-rin; Wezîrî ew û zaroyên Şehrezadê ramûsan û bi jêweyeke nazik û dilnerm xatir ji wan hemiyan xwest. Bi wî awayî, wî berê xwe da Samarkand el-Acemê û bi rahetî û xweji gîhajt wê derê. Xelkê bi kêfxweji pêjwazî li wî kir. Wî welatê xwe aqilane û adilane îdare kir û bû mîreicî binav û deng. Lê tijtekî zêde ku mirov der heqê wî de bêje nîne.

Mîr Şahriyar emir da nivîskarên herî jîrek yên serayê û yên 140

din li hemî welatên misilmanan da ku ji serî heta dawiyê tijtên ku di serê Şehrezadê re bihurîne binivîsîn bêt ku xwe di ser çu detayeke piçûk re jî çeng bikin.

Wan dest bi xebatê kir û bi herfên zêrîn sîh cild, ne zêde ne jî kê, nivîsîn; û navê wê berhevokê lici-rin "Kitêba derheqê hezar û jevekê."

Mîr Şahriyar emir da, da ku ji ber wê kitêbê, kitêbên din bêt nivîsîn û li welêt bêt belav kirin da ku nifjên nuh jê ders wergirin.

Kitêba orîjînal li serayê, li kaseya hikûmetê, li bin çavdêriya wezîrê xezîneyê hate vejartin.

Mîr Şahriyarû jina wî ya bextewar Şehrezad, Mîr Şahze-

man û jina wî ya spehî Dinyazad û her sê zaroyên Mîr, sal li pey salan bextewar û kêfxwej jiyan. Her roja wan ji ya berê xwejtir bû; her jev wek rûyê rojê ronî derbas dibû; heta Ew hat, Ew yê ku dostan ji hev vediqetîne, serayan hildiwejiîne, goran dikolîne, Ew yê ku qadirê her tijtiye.

Ev in yên ku bi xeberojkên hezar û jevekê tîn naskirinê; bi hemî tecrube, xwejikbûyîn û nadîrbûna xwe ve.

Lê Xwedê zanatir e. Tenê Ew dizane ka çi rast e û çi xelet e. Ew zanayê her tijtî ye.

Şikur ji Wî re yê ku her û her abadîn e. Ew yê ku tijtan bi gorî daxwaza xwe diguherîne lê Ew nayê guhertin. Ew yê ku hukumdarê tijtên xuyayî û nexuyayî, Ew yê zîndeyê yekta. Hêvî û silav û nîmetên herî bilind bi pêxemberê me re bin; yê herî waiz di nav waizan, li unîversûmê kulîlka dinyayê ku Xwedayê alemîn ew bi pêxemberî xelat Icir û hilbijart. Em xwe dispêrin wî deriyê dawiyê.

141

ÊDÎ GAZINA NEBÛNA KITÊBÊN KURDÎ MEKE,
NÛDEMÊ O WEŞANÊN WÊ BIXWÎNE!

Bîngehên Gramera Kurmancî / Celadet Alî Bedir-Xan

De û Dêmarî / Egîdê Xudo

Keskesor/ Nûredîn Zaza

Di Folklorê Kurdî de Serdestiyêke Jinan / Rohat

Hêz û Bedewiya Pênûsê / Mehmed Uzun

Mîrza Mehemed / Medenî Ferho

Milkê Evînê / Rojen Barnas

Zaroka Şevê/ Jack London / Werger: Mustafa Aydoğan

Biyani/ Albert Camus / Werger: Fawaz Husên
Mîrzayê Biçûk / A. de Saint-Eksupe'ry / Werger: Fawaz Husên
Gotin / YaşarKaya
Antolojiya Çîroka Nû ya Kurmancên Basûr /Xelîl Duhokî
Şevêo Spî / Dostoyevskî / Werger: Fîrat Cewerî
Mijk û Mirov / John Steinbeck / Werger: Fîrat Cewerî
»
Bexçeyê Vîjne / Çexov / Werger: Fîrat Cewerî
/ Werger: Fîrat Cewerî
Li Benda Godot / Samuel Becket
Gotinêri Navdaran / Fîrat Cewerî
Girtî / Fîrat Cewerî
Kevoka Spî / Fîrat Cewerî
Ufl-

Kultur, Huner û Edebiyat / Fîrat Cewerî
Dara Hinarê / Yaşar Kemal / Wergcr: Fîrat Cewerî
Dîwar/ Sartre / Werger: Fîrat Cewerî
Çîroka Malbata Evdo / Fîrat Cewerî
Celadet Alî Bedir-Xan / Fîrat Cewerî
Li mala mîr
HAWAR 2 cild / Amadekar: Fîrat Cewerî
Keça Kurd Zengê / Cemşîd Bender / Werger: F. Cewerî û S. Demir
Xezal / Sîma Semend
Evîna Reben / Derwêf M. Ferfio
Banga Hawarê / Medenî Ferho
Kultur û Raman / Şerefxan Cizîrî
Kurê Zinarê Serbilind / Sidqî Hîrorî

Şiîrên Bijarte / Mayakovskî / Werger: Suleyman Dcmir
Pêlên Bêrîkirinê / Mustafa Aydogan
Şerefa Wendabûyîya Katharina Blum / H. Böll / Werger: Ş. B. Soreklî
Hingê / Rojen Barnas
Sorê Gulê / Siileyman Demir
Pêşmerge / Rehîmê Qazî / Wergen Ziya Avci
Epîlog / Hesenê Metê
Siltanê Fîlan / Yaşar Kemal / Werger: Mustafa Aydogan
Evîn û Şewat / Sidqî Hîrorî
Çîrokên Hezar û Şevêkê / Werger: Serdar Rosan
NûdemWARGER
143
**

ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN ZAROKAN

Delala li daristanê razayî
Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran.
Dibêjin li welatekî, qral û qralîçeyek hebû. Her roj ji hev re digotin:
--Ax, ax! Xwezî zarokeke me hebûya. Wan tenê zarokek dixwest û hew.
Rojekê, qralîçe çû ber çem ji bo xwe bişo, beqek ji nav avê xwe çeng kir
derket derve û ji qralîçeyê re got:
--Miradê te wê were cih. Berî ku salekê te biqede, tu ê keçekê bînî
dinyayê... Tiştê ku beq got, bi rastî jî hat cih û qralîçeyê berî salekê keçek
anî dinyayê.
Keçik wisa delal bû ku qral ji kêfan difiriya. Îca wî rabû ji bo vê yekê
şahiyeke mezin li dar xist. Wî ne tenê eqreba û nas û dostên xwe gazî
şahiyê kir, ji bo ku zarokê nezerî nekin gazî periyên jî kir.

Di qraliyeta wî de sêzde perî hebûn. Lê belê, ji ber ku li qesrê diwanzdeh sênîkên zêrîn ên xwarinê hebûn, yek ji wan periyên nehat gazîkirin...

Şahî pir muhteşem derbas bû. Ber bi dawiyê jî periyên tiştên qenc û baş ji bo zarok anîn zimên: Yekê esalet, yekê delalî, ya sêyemîn dewlemendî, ya çaremîn kubarî xwest. Û li dinyayê çî tiştên xweş û baş hebin, ha wisa li dû hev ji bo keça qral hatin xwestin.

Piştî ku yanzdeh periyên ji bo keça qral tiştên qenc xwestin, periyên sêzdemîn bi carekê derket holê. Ji ber ku ew ji bo şahiyê nehatibû vexwendin, pir aciz bûbû û wê dixwest heyfa xwe hilîne. Bêyî ku silavekê bide kesekî, periyên sêzdemîn bi dengekî bilind qîriya got:

--Dema keça qral bibe panzdeh salî, nîkê teşiyekî wê di tiliya wê re here û ewê di cih de bimire.

Paşî ew perî bi wê hêrsa xwe ji salonê derket çû. Ji tirsan deng ji tu kesî dernediket. Îca periyên diwanzdemîn, ku hê xweziya xwe negotibû, hat cem qral û qralîçeyê, û got:

--Ev wê nebe mirineke rastîn, lê keça qral wê bi qasî sed salan di xew de bimîne.

Periyên diwanzdemîn wisa got, ji ber ku wê nikaribû nifira periyên sêzdemîn bi temamî betal bike, lê tenê dikaribû xirabiyên wê kêmbike.

Qral jî ji bo ku keça xwe ji vî xirabiyê biparêze, ferman da ku hemû teşiyên li welêt bînin şewitandin.

Yeko yeko hemû daxwazên periyên di keçikê de pêk hatin. Ew wisa delal, wisa bixîret, wisa kubar û wisa bîaqil bûbû ku çî kesê ew didît, dibû heyrana wê û jê gelek hez dikir.

Îca roja ku keçik ket panzdeh saliya xwe, qral û qralîçe ji qesrê derketin derve. Keçika ciwan jî bi tena serê xwe ma. Ew jî çû yeko yeko li gorî dilê xwe li her derê qesrê geriya.

Wê, dawiyê gihîşt birceke kevn û ji derenceyên wê yên teng hilkişiya. Li jorê deriyekî biçûk derket pêşiya wê. Li ser derî mifteyek hebû. Keçikê ew mifte bada û derî bi carekê vebû... Pîrejineke ku teşî dirêsiya, li wê odeya bircê bi tena serê xwe rûdinişt.

--Rojbaş pîrê, tu li vir çi dikî?, got keçika ciwan.

--Ez teşî dirêsim keça min, got pîrê û serê xwe hejand.

Keçikê got:

--Ew çi ye di destê te de pîrê, tu wisa bi kêfxweşî digindirînî ?

Keçikê wisa got û ji bo ku ew jî teşî birêse, teşî ji destê pîrê girt... Lê keçikê çawa dest avêt teşî, qedera xirab di wê kêliyê de pêk hat, nîkê teşiyî di destê wê re çû... Û keçik li ser nivîneke li odeya pîrê ket xeweke kûr û giran... Û ev xew li her derê qesrê belav bû...

Qral û qralîçe, ku hê nû vegeryabûn qesrê û ketibûn salona mezin, ew jî di xew re çûn. Û tevî wan, li qesrê, her kes û her tişt di xew re çû.

Hesp di tewlê de ketin xewê, kûçik di hewşê de, kevok li ser banê, mêş li ser dîwaran. Hetta, agirê di nav tifikê de jî di xew re çû... Aşpêja ku di wê kêliyê de porê alîkarê xwe dikişand jî, porê wî berda û di xew re çû. Û ba sekinî, pelek tenê jî êdî nelebitî li ser darên dora qesrê.

Dar û striyên li dora qesrê her roj zêdetir mezin û bilind bûn. Di demeke kurt de, qesr bi tamamî winda bû, hetta ala li ser bana qesrê jî êdî xuya nedikir...

Di wî welatî de, çîroka “Delala li Daristanê Razayî”, ku ev nav li keça qral hatibû dayîn, her diçû belav dibû.

Carcaran, kurên qralên welatên din dihatin, nêzî qesrê dibûn û hewl didan dar û strî bidin alî û bikevin hundir, lê belê ev yek mumkun nedibû. Wan nikaribû biketanê. Striyan mîna bi dest û lepan ew digirtin û bernedidan. Prensên ciwan li wir dieliqîn. Wan nikaribû xwe rizgar bikin û li wir bi awayekî pir xirab dimirîn...

Piştî gelek û gelek salan, kurê qralekî hat wî welatî. Mirovekî ixtiyar derket pêşiya wî prensî û çîroka wan dar û striyan jê re vegot.

Li gorî wê çîrokê, li dû wan dar û striyan qesrek hebûye, tê de jî keça delal a qralekî ji sedsalan û vir ve razabûye, navê wê jî “Delala li Daristanê Razayî” bûye.

Tevî keçikê, qral, qralîçe û hemû qesr razayî bûne. Mirovê ixtiyar ji bav û bapîrê xwe bihîstibûye ku gelek prens çûne wir, hewl dane dar û striyan bidin alî, lê belê ew li wan striyan eliqîne û li wir bi awayekî pir xirab mirine. Lê prensê ciwan ji mirovê ixtiyar re got:

--Tirsa min ji tu tiştî nîn e, ez ê herim wê derê. Ez dixwazim “Delala li Daristanê Razayî” bibînim. Ixtiyarê dilpak kir nekir, prens lê guhdarî nekir. Tabî di vê navberê de jî sed sal xilas bûbû û êdî ew roj hatibû; roja ku diviyabû “Delala li Daristanê Razayî” hişyar bibûya.

Dema ku kurê qral nêzî striyan bû, dît ku striyên ku rê girtibû, bi carekê bûn kulîlkên muhteşem û rê ji prens re vekirin. Piştî ku prens derbas bû, ew kulîlk dîsa li dû wî bûn strî û rê girtin.

Prens gihîşt ber qesrê û dît ku hesp û kûçikên nêçîrê tevde radizên. Li ser banê, kevokan serê xwe xistine bin perên xwe û razane. Û dema ku prens ket nav qesrê, dît ku mêş jî li ser dîwaran radizên... Destê aşpêjê hê jî li hewayê ye û jinika xizmetkar jî li ber mirîşkeke reş rûniştîye û amade ye wê bipirtikîne. Li jorê jî, qral û qralîçe rûniştîne ser derenceyan û razane. Qesr wisa bêdeng bû ku prens dengê nefesa xwe jî dibihîst.

Dawiyê, prens gihîşt bircê û deriyê odeya biçûk a ku prensesa delal lê radiza, vekir. Ew li wê derê bû, û ew wisa delal bû ku devê prens ji hev vekirî ma. Prens piştî çû, xwe bi ser wê de xwar kir û ji rûyê keçikê maçî kir. Tam di wê kêliyê de “Delala Li Daristanê Razayî” hişyar bû, çavên xwe vekirin û bi bişirînekê li prens nihêrt.

Paşî herdu bi hev re ji wir derketin. Û qral, qralîçe, her kes û her tişt hişyar bû. Her kesî bi awayekî ecêbmayî li hev dinihêrt. Di tewlan de hesp radibûn pêdarê, kûçikên nêçîrê dûvê xwe dihejandin û li vî alî wî alî bazdidan. Li ser banê, kevok serê xwe ji bin perên xwe derxistin, li dora xwe nihêrtin û ber bi gundan firriyan. Mêşên li ser dîwaran vizeviz kirin û dîsa firriyan; agirê nav tifikê pêket, geş bû û xwarina li ser pijiya. Aşpêjê porê alîkarê xwe dîsa kişand û jinika xizmetkar jî pirtikandina mirîşkê xelas kir...

Piştî demeke pir kurt, daweta prens û ya “Delala Li Daristanê Razayî” bi awayekî muhteşem hat çêkirin. Û ew herdu heta dawiya jiyana xwe bi şad û bextewarî jiyân...

Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.

Çavkanî:

<http://modersmal.skolverket.se/nordkurdiska/images/stories/nordkurdiska/ciroke08/index.htm>

razayî: raketî, nivistî, di xew

qral: paşa, şah, mîr, siltan, serok, padîşa

qiralîçe: jina qiralekî, şabanî, xatûn

gazî kirin: bang lê kirin

qedîn: bi dawî hatin, xilas bûn, neman

jiyan: rewşa piştî welidînê û berî mirinê

strî: darikên zirav û tûj, tîkan

ixtiyar: êxtiyar, (mirova/ê) pîr, salmend, mezin

ban: banî, serban, seqf, rexê serî yê xanî

Çîrokeke Jacob & Wilhelm Grimm

ÇÎROKA ZAROKAN

Gur û heft karik

Hebû carek ji caran, xêr û xwesî bibarin li hazir û guhdaran...

Hebû tunebû, dibêjin bizineke pîr û heft karikên wê hebûn. Çawa her dayik ji

zarokên xwe hez dike, wê jî wisa hez ji karikên xwe dikir. Rojekê, bizinê xwest biçe zozanan ji bo biçêre, guhanên xwe tijî şîr bike û bîne zikê karikên xwe têr bike. Wê berî ku derkeve, tembî li karikên xwe kir û got:

--Karikên min ên delal, niha ez ê herim zozanan, lê divê hûn derî ji tu kesî re venekin, û bi taybetî hay ji gur hebin ha! Eger gur bikeve hundir, ew ê we hemûyan bi carekê de daqurtîne. Ew pir fêlbaz e haa!, lê bila di bîra we de be ku dengê wî yê stûr, lingên wî yên reş hene, hûn ê bi wî rengî karibin wî nas bikin. Jixwe dema ez vegerim, ez ê vê stranê ji we re bibêjim:

Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik ha(a)tiye danan

Karikan got:

--Bila dilê te rehet be dayê, em ê hay ji xwe bimînin, û ji xeynê te jî, derî li tu kesî venekin.

Hema di wê kêliyê de çima gurê fêlbaz jî di ber derî re derbas nedibû!

Gotinên

dawî yên bizinê, yên ku wê ji karikên xwe re gotin, çûn guhên gur jî.

Piştî ku bizina pîr bi dilekî rehet derket çû û karikan jî derî girt, gur hat li derî xist û bi dengê xwe yê stûr got:

Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik ha(a)tiye danan

Lê belê karikan ji dengê wî yê stûr gur nas kirin û bi qîrîn gotin:

--Em derî ji te re venakin! Tu ne dayika me yî! Dengê dayika me zirav û şêrîn, lê dengê te qalind e. Em dizanin ku tu gur î!

Gur zûzûka çû bazarê û ji wir hinek kils kirî. Wî ew kils xwar û dengê wî pir zirav bû. Piştî jî ew vegeriya malê, li derî da û vê carê bi dengê xwe yê zirav ew stran got:

Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik ha(a)tiye danan

Lê belê karikan pêşî got qey diya wan hatiye, lê Piştî fikirîn ku mumkun e dîsa gur be yê li ber derî. Îca wan ji gur re got:

--Ka lingên xwe di bin derî re nîşanî me bide.

Gur di bin derî re lingên xwe nîşanî wan da.

Karikan got:

--Ev ne lingên dayika me ne! Lingên dayika me spî, lê yên te reş in. Na, na! Tu ne dayika me yî, tu gur î, em derî li te venakin.

Gur pir aciz bû, lê lazim bû ji bo xapandina wan riyekê bibîne. Îca ew rabû zûzûka çû cem nançêkerêkî û jê re got:

--Nançêkerê delal, piyên min birîn bûne! Ji kerema xwe hûn dikarin hinek hevîr

deynin ser piyên min!?

Nançêker hinek hevîr çêkir û danî ser piyên gur, û gur vê carê çû cem Aşvanekî û got:

--Ji kerema xwe ka hinek arvan li piyên min bike.

Aşvan fikirî û di dilê xwe de got "Herhal gur dixwaze dîsa yekî bixapîne".
Û ji ber wê Aşvan xwe li kerîtiyê danî û daxwaza gur neanî cih. Lê belê gur got:

--Ku tiştê ji te re dibêjim tu pêk neynî, ez ê te bixwim haa!

Aşvan tirsîya, û rabû hinek arvan li ser piyên gur reşand û piyên wî bûn spî. Ya erê, mirov wisa ne!

Cara sisêyan gurê fêlbaz dîsa çû ber deriyê mala bizin û karikan, li derî da û bi dengekî zirav got:

Şenga min Penga min

Dayik çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû bikin, derî vekin

Dayik ha(a)tiye danan

Karik qîriyan gotin:

--Ka lingên xwe di bin derî re nîşanî me bide, ji bo ku em bizanibin ka tu bi rastî jî Dayika me yî an na!

Gur lingên xwe yên arvankirî di bin derî re nîşanî wan da û gava karikan jî dît ku ling spî ne, kêfa wan hat û gotin:

--Ev Dayika me ye, Dayika me. Hem deng zirav e, hem jî ling spî ne.

Karikan bi lez û bez derî vekir, lê derî çawa vebû venebû, gur ket hundir û xwe

çeng kir ser wan. Karik pir tirsîyan û xwestin xwe veşêrin. Yek ji wan xwe xist binê maseyê, yekî xwe xist binê nivînan, yekî xwe xist nava sobeya vala, yê çaremîn li mitbaxê, yê pêncemîn li nav dolabê, yê şeşemîn li binê

destşokê û yê heftemîn jî di nav saeta dîwêr de xwe veşart. Lê belê gur ew yeko yeko dît û bi carekê avêt devê xwe. Lê gur tenê nekarî ew karikê ku xwe di nav saeta dîwêr de veşartibû, bibîne.

Jixwe ji ber ku zikê gur jî têr bûbû, wî devê xwe alast û çû xwe li derve, li bin

darekê, li ser hêşînahiyên dirêj kir û raket.

Piştî demeke kurt, dayika karikan, yanî bizin, ji zozanan vegeriya... Ax, çi dîmeneke xembar îca li hêviya wê bû! Deriyê mezin ser piştî vekirî bû, mase, kursî, destşok û nivîn şikiyabûn û tev li erdê belawela bûbûn. Bizin bi saw û tirseke mezin li karikên xwe geriya, lê bêfeyde bû. Wê bi dorê bi navê wan ew gazî kirin, lê tu bersiv derneket. Tenê dema bizinê navê karikê xwe yê herî biçûk got, dengê zirav hat bihîstin:

--Ez li vê derê me dayê, di nav saetê de me!

Bizinê çû karika xwe ji nav saetê derxist û girt hembêza xwe. Karika biçûk jî ji dayika xwe re got ku gur hatiye û karikên din hemû xwarine... Îca hûn bifikirin ka bizina pîr li ser karikên xwe çiqas hêstir barandine.

Bizina pîr bi xemgînî ji malê derket, karika biçûk jî da dû diya xwe. Gur, li bin darekê, li ser hêşînahiyên xwe dirêj kiribû, û ketibû xeweke wisa giran ku xurexur û pifepifa wî bû. Bizinê çû ji nêz ve li zikê gur nihêrt û ferq kir ku tiştê di zikê wî yê mezin de dilebite, dileqe.

--Xwedêyo, karikên min ên biçûk ku gur ew xwaribûn gelo hê jî zindî ne?, got bizinê.

Îca bizinê bilezûbez çû malê, meqes û ta û derzî anî, zikê gurê pîs bi meqesê qelaşt û yeko yeko hemû karikên xwe jê derxistin. Rewşa hemû karikan gelek baş bû, ew zindî bûn, ji ber ku gur hingî lez kiribû, hema hemû karikan bêyî bicû, bi carekê daqurtandibû.

Îca ew çi kêfxweşiyek bû ji bo bizinê û ji bo karikan...

Bizina pîr ji karikên xwe re got:

--Haydê delalên min, de zû herin keviran bînin, bila keveren wisa mezin bin ha! Hê berî ku gur ji xew şiyar bibe, em ê zikê gur bi keviran dagirin. Û heft karik çûn kevirên mezin gindirandin anîn û heta devîmanê zikê gur bi keviran dagirtin. Bêyî ku haya gur jê çêbe, bizina pîr zûzûka zikê wî dirût û çû xwe tevî karikên xwe, li pişt darekê veşart.

Dema ku gurê pîs û çavbirçî ji xew şiyar bû, rabû ser xwe. Lê ji ber wan kevirên mezin, ew wisa tî bûbû ku xwest here ji bîrekî hinek avê vexwe. Lê belê dema ew ber bi bîrê ve dimeşiya kevirên nav zikê wî li hev diketin û dikirin gurmegurm. Îca gurê zikmezin got:

Ev çi gurmegurma zikê min e

Min heft karik daqurtandin

Lê gelo ew xewnek bûye?

Gur heta bîrekî bi zorê meşiya, Piştî xwe bi ser bîrê de xwar kir û hinek av vexwar. Lê belê kevirên di zikê wî de wisa giran bûn ku ew bi carekê ket binê bîrê û bi awayekî pir xirab di nav ava bîrê de xeniqî.

Îca heft karik tevî diya xwe bi bazdan hatin, li dora bîrê bi kêfxwesiya mirina gur reqisîn û Piştî jî çûn mala xwe.

Çîroka me qediya, xêr û xwesî li hazir û guhdaran bariya.

ÇÎROKA ZAROKAN

Keçika Niftikfiroş

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran.

Dibêjin rojekê hewa ecêb sar bû; ji serê sibê ve berf dihat; dinya hêdî hêdî tarî dibû. Ew roj, roja dawîn a salê bû, yanî şeva sersalê bû. Dora rojê wê bûbûya saleke nû. Li derve bayekî sar, sermayeke mîna qeşa hebû. Di wê roja sar de keçikeke biçûk li kolanan dimeşiya. Ne şewqeyek li serê wê, ne jî cotek gore li piyên wê bûn. Serê sibê dema ew ji malê derketibû, cotek şimik ê pir kevn û jê re pê re mezin xistibû piyê xwe.

Gava ku keçika biçûk derket derve û xwest zûzûka xwe ji erebeyan bide alî, şimikên wê ji piyên wê derketin. Ew li hêviyê ma ku erebe tev derbas bibin û here şimikên xwe ji cadê bîne. Lê belê tam di wê kêliyê de kurikekî biçûk û şûm rahişt ferek şimika wê, bazda çû; fera din jî di bin tekerên erebeyan de perçiqîbû. Êdî keçika feqîr pêxwas mabû.

Keçika biçûk çend pakêt niftik xistibûn nav çenteyeke kevn û avêtibû stûyê xwe.

Wê pakêtek jî girtibû destê xwe û ji bo ku wan bifiroşe, kolan bi kolan digeriya. Lê ji ber ku hem hewa pir sar bû, hem jî ew roj, roja dawîn a salê bû, herkesî dilezand, haziriya xwe ya sersalê dikir û qet bala xwe nedidan halê perîşan ê keçikê. Êdî bûbû şev û keçikê pakêtek tenê jî niftik nefirotibû. Ji sermayê bedena wê diricifî, ji birçînan jî dilê wê dibihurî. Lê ew hê jî li bendê bû ku niftikên xwe bifiroşe.

Kuliyên berfê xwe li porê wê yê reş radipêçiya. Porê wê ji berfê spî bûbû. Hemû paceyên xaniyan bi ronahiya lampeyan dibiriqîn; hema hema ji hemû malan bêhna xweş dihat, bêhna goştê qazên biraştî. Ew qaz ji bo şîva sersalê hatibûn biraştin. Ji birçînan û ji ber wê bêhna xweş gavên wê sist dibûn û wê hew dikaribû bimeşiya.

Keçika niftikfiroş wisa westiyabû û wisa cemidîbû ku dawiyê fikirî li navbera du xaniyan, li quncikekî rûnê, bêhna xwe vede. Keçik li wî quncikî rûnişt û piyên xwe yên biçûk ber bi xwe ve kişandin; lê belê ew ji berê zêdetir dicemidî û dilerizî, lê dîsa jî wê nediwêrî vegere mala xwe. Ji ber ku wê banknotek tenê jî qezenc nekiribû û bavê wê jî lê bidaya.

Destên biçûk ên keçikê ji sermayê qerisîbûn. Wê kêliyê tişteke hat bîra wê. Wê di dilê xwe de got “Ma wê çi be ez tenê darikekî niftikê bişewitînim û tiliyên xwe piçek germ bikim?”. Wê wisa got û piştî rahişt darikekî niftikê şewitand. Weyy, ew çi ronahiyeke geş, çi germahiyeke şîrîn bû! Bi germahiya agirê darikê keçika niftikfiroş ket nava xeyalan. Wê digot qey

ew li ber sobeyeke mezin û germ rûniştiye. Keçika feqîr tam piyên xwe yên qerisî ber bi sobeyê ve dirêj bikirana ku bi carekê agir tefiya û sobe ji ber çavên wê winda bû. Keçikê dît ku ew bi tena serê li quncikê rûniştiye û di destê xwe de wî darikê niftikê ku heta nivî şewitiye digire.

Keçika niftikfiroş darikê din jî şewitand û dîsa ket nav xeyalan: Bi ronahiya agir, êdî dîwarê malê jê re xuya nedikir. Li nava malê, li salona mezin, maseyê xwarinê hebû: rûbereke spî û delal li ser maseyê hatibû raxistin, li ser jî sênîkên porselen ên muhteşem hebûn. Tam li ortê maseyê, di nav tepsiyekê de qazê biraştî hebû. Lê bi carekê qazê xwe ji maseyê çeng kir, ket erdê û bi kêr û çetela bi piştê wê ve daçikandî, berê xwe da keçikê û li ber sekinî. Lê di wê kêliyê de agirê darikê vemirî. Li pêşya keçikê, ji dîwarekî stûr û pê ve dîsa tu tişt nema.

Keçikê darikê din pêxist û wê xwe li ber dareke xemilandî ya sersalê dît. Bi sedan findên biçûk ên rengorengo bi darê ve daleqandî bûn û tev pêketî bûn. Keçikê destê xwe dirêj kir ku yek ji wan findan bigire, lê belê ew darik jî vemirî û wekî ku dar ber bi asîmanê ve hilkişiya û find jî li asîmanê tevde bûn stêrk. Yek ji wan stêrkan li asîmanê xetek kişand, ber bi jêr ve şemitî û winda bû çû. “Aah, dîsa kesek wê bimire!” got keçika biçûk di dilê xwe de.

Belê, dapîra wê jê re gotibû ku “Gava stêrkek bixurice, yanî bişemite, wê çaxê canek wê hilkişe jorê û here bihuştê.” Ax, ew dapîra delal, yekane kesa ku pir ji keçika biçûk hez dikir û jê re qenc bû, berî bi demekê ew jî mîna stêrkekê xuricîbû.

Keçikê darikê din pêxist, ronahiyeke geş çêbû û dapîra wê ya ixtiyar hat li ber keçikê sekinî. Keçikê xwe avêt hembêza wê û qîriya got: “Pîrê ! Dapîra min a delal, min jî bi xwe re bibe! Ez dizanim dema ku ev darik vemire, tuyê jî herî. Wek sobeya germ, wek qaza biraştî û wek dara

xemilandî ya sersalê, tuyê jî ji ber çavên min winda bibî. An li vir li ba min bimîne, an jî min bi xwe re bibe.”

Û keçikê darikê din jî şewitand, piştî wî yekî din û yekî din..., heta ku wê hemû pakêt xilas kir ji bo ku dapîra xwe ya delal hinekî din jî li ba xwe bigire. Wê demê dapîra wê keçik girt hembêza xwe û ew herdu bi hev re ber bi asîmanê ve firiyan û çûn.

Dora rojê, serê sibê, kesên ku ji wê kolanê diboriyan, di wê quncikê de cendekê keçikê dîtin; hinarikên wê sipsor bûbûn û bişirîneke sivik li ser rûyê wê bû. Ew di wê şeva sersalê de ku gelek bextewar jî bûbû, ji sermayê miribû. Darikê niftikê yê şewitî di destê wê yê biçûk de bû û darikên din ên şewitî jî li erdê belav bûbûn.

Ji nav wan kesên ku li ser serê wê bûbûn, yekî bêwijdan ji bo wê got “Ev çi ehmeq e! Çawa wisa fikiriye ku bi darikan wê karibe xwe germ bike!” Lê yên din li ser keçikê hêstir barandin; û ji wan kesî nizanibû ku keçikê çi tiştên xweş û spehî dîtibûn di wê şeva sersalê de. Û dîsa kesî nizanibû ku keçik di hembêza germ a dapîra xwe de ketibû sala nû.

Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.

Çavkanî:

<http://modersmal.skolverket.se/nordkurdiska/images/stories/nordkurdiska/cirok08/index.htm>

ÇÎROKÊN KLASÎK ÊN CÎHANÊ

werdeka biçûk î nexweşik

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibarin li hazir û guhdaran...

Dibêjin rojekê, li gundekî pir dûr, mak werdekek bi kurk dikeve û çîçikên wê yeko yeko ji hêkan derdikevin. Ew ji hev delaltir û şîrîntir in. Lê mak werdekê bi carekê şaş û metel dimîne û pir xemgîn dibe. Çimkî ji hêka

dawîn çîçikeke pir cihêreng derdikeve. Ew çîçik ji çîçikên wê yên din mezintir e û rengê wê jî ne zer, lê gewr e.

Mak werdekê difikire û ji xwe re dibêje ku ew ê nikaribe vê çîçika nexweşik xweyî bike.

Lê gelo ev çîçik werdeka cihêreng ji ku hatiye wir? Ew naşibe tu sewalên nav koxikê!... Û dema ku ew li dû mak werdekê digere, çîçikên mirîşkan û yên elokon tev jê aciz dibin û wê ji xwe dûr dixin.

Çîçikên din ên mak werdekê jî bi nikulên xwe wê pir diêşînin. Di nav xwe de jî dibêjin:

--Eva nexweşik çima tê nav me? Kes wê naxwaze ! Bila ji vê derê here ! Ew bi rastî jî çiqas nexweşik e.

Piştî demekê, sewalên din çîçik werdeka feqîr ji koxikê diavêjin û ew jî diçe dikeve nav bexçeyekê ku çivîkên biçûk tê de bask li hev didin û virde wirde difirin. Çîçik werdek ji wan re dibêje:

--Ez li vir li malbata xwe digirim! We malbata min nedîtiye?

Çivîkên biçûk lê dinêrin û jê re dibêjin:

--Ne mumkun e tu ji malbata me bî. Tu pir mezin î. Tu dixwazî here malbata xwe li wî aliyê din ê golê bigere.

Çîçik werdeka belengaz bi ya çivîkan dike û berê xwe dide aliyê din ê golê. Îca ew li wê derê rastî werdekeke kûvî tê û jê dipirse:

--Te malbata min nedîtiye?

Werdeka kûvî bersiva wê dide û dibêje:

--Tu pir dereng hatiyî, biçûkê. Kes li vir nemaye, herkesî koç kiriye.

Hê ev gotin di devê wê de ne ku bi carekê dengê fişekan tê û ew ji çîçik werdekê re dibêje:

--Biçûkê, zû here xwe veşêre. Nêçîrvan wê werin vir. Ew dijminên me yên herî xetere ne.

Gava ku çîçik werdek xwe di nav hêşînahiyan de vedişêre, werdekên kûvî jî bask li hev didin û ber bi welatên germ ve difirin.

Dû re kûçîkek tê ber çem, dora xwe bêhn dike û bêyî ku tiştêkî bi dest bixe vedigere, ji wir diçe.

Îca çîçîka me ya feqîr, ji ber tiştên ku dibîne û dibihîze, hê zêdetir şaş û metel dimîne, û ji wê derê ku ji bo wê pir xetere ye, bi reverev bazdide diçe. Lê ew ê bi ku de biçê? Gelo ew dîsa here nav koxîka xwe? Na! Ev ne mumkun e, çimkî tu kes wê li wê derê naxwaze.

Çîçik werdek serê xwe dixê ber xwe, hêdî hêdî dimeşe heta ku digihîje ber holikeke biçûk.

Îca ew dikeve hundir û dibîne ku mirîşkek bi kurk ketiye, pîrejînek li ber agir rûniştiye xwe germ dike, pisîkek jî li ser nivînan xwe dirêj kiriye.

Çîçik werdeka me, ku ji xwe re piçek germahiyê digere, bi awayekî pir xirab tê pêşwazîkirin.

Mirîşka spî pir bi hêrs diqudqude, pisîkê boz xwe gij dike û bi dengêkî xofdar dinewîne.

Herduyan xwe çeng dikin ku wê bigirin, çîçik werdek heta ku jê tê bazdide û ji wir bi dûr dikeve.

Dawiyê zivistan tê, lepelepe berf dibare û her der qeşa digire. Mixabin çîçik werdek ji xwe re cihekî bi ewle nikare bibîne û ew mecbûr dimîne ku dîsa here golê û li wir bimîne. Lê ji xeynî wê tu sewal li wê derê nemaye. Masî di bin qeşayê de razane û hemû werdek ber bi welatên germ ve firiyane. Çîçik werdeka me jî li wê derê bi tena serê xwe bi zivistaneke dijwar re rû bi rû dimîne.

Lê rojek ji rojan, piştî şeveke sar û seqem, çîçik werdeka belengaz dîsa ji xwe re li cihekî digere. Dawiyê jî ew ji xwe re maleke germ peyde dike. Ew tevî ku bêhemdê xwe gelek tişt dirijîne dişikîne jî, xwediyên malê wê

naqewirînin û dihêlin ku çîçik werdeka me wê zivistanê li cem wan derbas bike.

Roj li dû hev derbas dibin û dawiyê bihar tê. Çîçik werdeka me ya ku êdî têra xwe mezin bûye, rojekê bêriya golê dike. Îca ew pir bi xemgînî xatir ji wê malbata dilpak dixwaze û berê xwe dide golê.

Gava ku çîçik werdek digihîje golê, dibîne ku sê qûyên delal di nav avê de ne. Ew jê dipirsin dibêjin:

--Tu ji ku derê têtî? Tu li ku derê bûyî ? Tu çima bi me re nehatî?

Îca çîçik werdeka me dibîne ku ew bi awayekî pir ecêb dişibe wan qûyan, û tê famkirin ku werdeka biçûk î nexweşik ku herkes jê aciz dibû, ku kêfa tu kesî jê re nedihat, ew ne werdek bûye, lê belê ew qûyeke delal û ciwan bûye.

Çîçik werdeka nexweşik dawiya dawî digihîje malbata xwe. Ew êdî bûye qûyeke simspî.

Ew ji xwe pir bawer e û pir bi ezamet û kubarî di nav golê de avjeniyê dike. Ew ê êdî ne ji sermayê, ne ji xirabiya mirovan, ne jî ji birçîmayîne bitirse. Ê dema rojên sar jî werin, ew ê tevî malbata xwe bifire here ber bi welatên germ.

Çîroka me qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya...

Çavkanî:

<http://modersmal.skolverket.se/nordkurdiska/images/stories/nordkurdiska/cirok08/index.htm>

**

ÇÎROKÊN MALPERA ÇIRA

Gula Keskezer

Weşandin: 03/04/2012 , Paşa Brodrêj

Di dem û dewranekê kevnare de padişahê hebû. Padîşahê bi hêz û qudret, bi hezaran şerûdên wî, bi kûp û kûzan zêrê wî hebûne, lê lawê wî tunebûye. Tenê sê qîzikên wî hebûne. Ji sê qîzikan didu zewicîne, ya herî biçûk û herî xasek nezewiciye. Nav û dengê bedewtiya wê ji Çînê heta Maçînê belav bûye.

Herroj duroj xwazgînçiyên wê tên. Zarokên mîr û began, qeral û hikumdarên, qasîd û xwazgînçiyên dişînin cem Padîşahî, bavê wê, lê qîzik bi kesekî qayil nabe, kî tê, destvala vedigere. Êdî bavê wê yê Padîşah dinêre nabe, ferman dide hevvelatiyan ku “bila sê roj li ser hev, hevvelatiyên ku çardeh saliya xwe tije kirine, di ber şibaka qîza wî re derbas bibin û bejn û bala xwe nîşan bidin. Teyrê Siûdê li ser serê kê venişe, qîza min ê bi wî ra bizewice”, dibêje.

Di nav sê rojan da, çi xizan û çi dewlemend, tevayiya hevvelatiyan yê ku temenê wan di navbera çardeh û şêst salî da, kincên xweşik li xwe dikin, traş dibin, porê xwe şe dikin, simbêlên xwe ba didin û hinek bi peyatî, hinek bi siwarî di ber şibaka qîzikê re derbas dibin.

Teyrê Siûdê, sê rojan li ser hev difire û difitile, lê li ser serê kesî venişe. Roja sêsiyan, berêvarê, hindik maye ku qewla sê rojan dawî were, Padîşah fermaneka din dide şerûdên, ku binêrin tu kesê ku ji ber şibakê derbas nebûye, maye an na.

Şerûd dikevin nav kuçe û kolanan, xanî û baniyan qulbîqul digerin. Herî dawiyê keçelokek qirêj û reben di gundekê derveyî kelê de dibînin. Keçelok naxwaze ji mala xwe derkeve, “dev ji min berdin”, dibêje. “Ez li kû qîza Padîşahî li kû!” Şerûdên Padîşahî guh nadin mizmiza wî, hema em bibêjin, bi darêzorê wî ji hundirê malê derdixin û di ber şibakê re derbas dikin.

Teyrê Siûdê, rasterast difire û li ser serê Keçelokî datîne. Padîşah hawar dike, aman dike, naxwaze vê encamê qebûl bike. Bi ferman dibêje, bila

careke din Teyrê Siûdê bifire! Teyrê Siûdê careke din difire û car din rasterast diçe ser serê Keçelokî vedinişe. Padîşah cardin qebûl nake. Teyrê Siûdê cara sêsiyan dîsa difire û li ser serê Keçelokî vedinişe. Hewelatîyên li kuçe, kolan û meydanan civiyanin, xwe diqilqilinîn û li hemberî helwesta Padîşahî nerazîbûna xwe nîşan didin. Eger Padîşah careke din ji qewla xwe çiv bide, dê rewş xerab bibe.

Padîşah dinêre nabe, dibêje; “min keça xwe da û çû, bes ez naxwazim careke din wê bibînim, wê ji ewladiya xwe diavêjim û ji mîrata xwe bêpar dikim. Li bin dîwarê Kelayê xaniyekî bidin wan, xwarin û vexwarina wan bidin, hew. Êdî bila ne ew min bibînin û ne jî ez dixwazim wan bibînim”. Çend sal û demsal dikevin navberê, em nizanin, ji rojan rojekê çavên Padîşahî kor dibin û dinya lê dibe şereş. Herdu wezîrên Padîşahî, ji yekî ra dibêjin Wezîrê Milê Çepê û yê din ra jî dibêjin, Wezîrê Milê Rastê, di heman demê da herdu wezîr zavayên wî ne jî, li defa hewarê dixin û ji heft êl û dewletan ra nijdevanan dişînin. Ji Çînê heta Maçînê, ji her qewmî û welatî hekîmên herî bi nav û deng tên, Padîşahê kor tertepêl dikin, merhemên cur be cur çê dikin û di çavên wî didin, bi şîrê şêran û ava ziyaretgehan çavên wî dişon, li ber serî rûdinin, ji Quranê, Incîlê, Tewrat û Zebûrê ayetan dixwînin, li ber qesra wî ga û beranan serjê dikin û goştê wan li xizanan belav dikin, lê tewş e. Her çi dikin û çawa dikin çavê Padîşahî venabin.

Dawîya dawî rîsîpiyekî gerok dibêje, hûn çi dikin bikin Gula Keskezer peyda bikin û perên wê deynin ser çavên Padîşahî, dê çavên wî vebin. Camêrê Rîspî van galgalan dibêje û ji ber çavan wînda dibe.

Wezîr û wezaretên dewletê dicivin, bi şev û rojan gengaşeyan dikin, lê nagihîjin tu encamekê. Bi şermokî û stûxwar derdikevin huzûra Padîşahî û neçariya xwe berpêş dikin û dibêjin, her me çi kir, em bi ser neketin.

Gula Keskezer heye an tune ye, li kîjan welat û herêmê peyda dibe, kes pê nizane.

Wezîrê Milê Çepê û yê Milê Rastê, di Serayê da xwedî hêz û qudret in. Piştî ku Padîşah kor dibe, hêz û qudreta wan zêde dibe, kar û bar, berpirsiyariya dewletê dikeve ser milên wan. Bê fermana wan, kes nikane xwe bilivîne û kes nikane tiştê bibêje. Padîşah jî bîr û baweriya xwe bi wan tîne û ji wan hez dike. Gava wezîr û wezaretên dewletê neçariya xwe rave dikin, Padîşah ji wan herduyan daxwaz dike ku elecele têkevin rê û li Gula Keskezer bigerin. Heqîbên wan ji zêr û diravan dadigrin, ji her yekî re gustîleka ku mora wî li ser, dide wan û dibêje; bi lez herin bi lez werin, lê destvala vemegerin!

Keça biçûk gava pê dihesa ku bavê wê kor bûye û herdu wezîr ketine dû Gula Keskezer, xwe diavêje stûyê Keçelokî.

“Keçelokê min, delalê min, rabe ser piyan û derkeve ser riyan”, dibêje. Keçelok dibêje.

“Ez heyrana te bim, dev ji min berde! Heya niha kî bi Gula Keskezer hesiya ye, kî dizane guleke wisa heya an na. Guleke wisa hebe jî yekî mîna min dê çawa wê peyda bike. Tika ji te dikim, dev ji min berde!”

“Keçeloko, şîrîno! Em perîşan, reben û bêxwedî ne. Firsend ev firsend e! Ger tu Gula Keskezer peyda bikî, dibe ku Bavê min me efû bike, em ji vê rezîliyê bifilitin.”

Keçelok dike nake, çi dibêje tal e, xwe ji destê wê rizgar nake. Baş e, dibêje. Ka rabe here cem bavê xwe, bila hema tirrbergîrekî, şûr û mertalekê kevn û mora xwe bide min, da ku ez jî têkevim dû Gula Keskezer.

Keçik xwe digîhîne cem bavê xwe, bi tika û dexaletan li ber wî digere. Virda wirda keçik bavê xwe razî dike û bi tirrbergîrekî û gustîla bi mor vedigerê malê. Keçelok nedibêje erê û ne jî na, li tirrbergîra xwe siwar

dibe berê xwe dide oxirê, pişta xwe dide felekê. Digihîje gundê ku berê lê dima, ji tirrbergîra xwe peya dibe, cil û cawên xwe diguherîne, hespa xwe ya kêhil ji tewlê dikşîne, zîn û zengûya girê dide, şûr û mertalê xwe dişidîne û hespa xwe radike pêdarê. Sê roj û sê şevan bêrawestan rê diçe û digihîje bajarekê mezin û şên. Bi salix û silûxên nişteciyan xwe digihîne Xana Leterê. Seyisên Xanê baz didin pêşiya wî, hespê wî dibin axurê, wî derdixin qata diduyan, ciyê ku mîvanên paye lê dimînin. Çawa xwe li ser ciyan dirêj dike, wisa xew ra diçe. Danê êvarê radibe, serê xwe dişo, cilên xwe yên pak û paqij li xwe dike, dadikeve aşxaneyê.

Hew dinêre li qoziyekê aşxanê, herdu wezîrên Padîşahî rûniştine eraq vedixwin. Qerwaş li dora wan digerin û xizmet dikin, koçekên bedew, ew qîzikên nîvtazî ji wan ra dilîzin, ew jî li ser wan diravan direşînin, kêf kêfa wan e. Keçelok li maseya kêleka wan rûdine, bangî xizmetkarî dike, bexşîşekê baş dixê nav lepê wî. “Qedehên wan vala mehêle. Bila têra xwe vexwin. Hîsab ji min e”, dibêje. Derengê şevê, herdu wezîr zîl zûrne serxweş dibin, heş li serê wan namîne. Geh direqisin, geh henek û geh şora dikin. Temamê mîvanên aşxaneyê li dora xwe dicivinîn û ji wan ra mey û eraqê îkram dikin.

Wezîrê Milê Çepê dibêje.

“Derdê me giran e birayên ezîz! Padîşahê me kor bûye û hiş li sêrî nemaye. Ferman daye me ku em jê ra Gula Keskezer peyda bikin. Kalepîrekî gêj xistiye hişî wî ku gava perên Gula Keskezer deyne ser çavên xwe, dê çavên wî vebin. Da ka, hela ji me ra bibêjin, guleka wiha heye an tune ye? Gelo kî bi navê Gula Keskezer hesiyaye hiii!”

Wezîrê Milê Rastê, “karê nebûyînê”, dibêje û qedeha meyê bi ser xwe de dike.

“Tiştê ku tune be, mirov dikane peyda bike hiii!”

Keçelok qedeha xwe ji şerefa wan ra bilind dike.

“Hinekî padîşah jî pirr ecêb in loo! Gava li ser textê xwe rûdinin, dixirifin. Dibêjin qey, dinya bi fermana wan çê dibe û bi fermana wan hildiweşe.” Herdu wezîr bi yek devî dibêjin.

“Wey xwedê emrê te dirêj bike. Çi galgalên rast û aqil dibêjî!”

“Noş ji bo mirovên aqilmend û zana re!”

“Noş ji bo we!”

Nêzî serê sibê, mîvanên Xana Leterê ji aşxaneyê radibin û ji bo razanê diçin odeyên xwe. Herdu wezîr, Keçelok û serxizmetkar tenê dimînin. Keçelok ji serxizmetkarî ra dibêje, tu ji me ra sê fîncan qehwaya tahl bikelîne û hinek avê jî pê re bîne bila wezîr serçavên xwe bişon. Serxizmetkar bi lez û bez qehwa tahl dikelîne, misîna avê ji wan ra tîne. Herdu wezîr, bi alîkariya Keçelokî û serxizmetkarî serçavên xwe dişon. Qehwa xwe ya tahl vedixwin û şûn da hinek hiş tê serê wan.

Keçelok dibêje, em ê niha peymanek çêkin. Qasî ku min ji we fam kir, tu hêviyek we tune ye ku hûn Gula Keskezer peyda bikin, lêbelê ez dixwazim dalyana xwe sihêtî bikim. Eger hûn bixwazin, ez li ser navê we li dû Gula Keskezer bazdim. Gava min ew peyda kir, ez ê wê bînim ji we ra. Lê du şertên min hene. Şertê min ê ewl; hûnê hezar zêrî bidin min, nîvê wan niha û nîvê din jî gava min Gula Keskezer anî, hûn çî dibêjin?

Herdu wezîr bi yek gotinê dibersivînin.

“Ev şertê te ji bo me qet gelş nîn e. Em razî ne. Bibêje şertê te yê diduyan çî ye?”

“Şertê min ê duduyan, ez ê qûna we dax bikim.”

Herdu wezîr vediciniqin, çavbeloqî dimînin, masûlkên serçavên wan dişidin, awirên wan di derbekê de diguhere. Wezîrê Milê Çepê destê xwe davêje şûrê xwe, Wezîrê Milê Rastê dest wî digire û ji Keçelok ra dibêje:

“Ka tu hinek ji me dûr bikeve, em ê bi hev bişêwirin.”

Keçelok ji aşxaneyê derdikeve. Herdu wezîr di nav xwe de diaxifin û qiseyên xwe dikin yek. Ji hev ra dibêjin, dibe ku ev dînê han Gula Keskezer peyda bike, baştirîn ew e ku em jê ra bibêjin, erê. Lê gava wî Gula Keskezer anî û daxwaziya diravan li me kir, em ê wî bikujin û zêrên ku me danê jî em ê paşda bigirin. Me ew kuşt şûn da, kî yê sirê me bizanibe.

Herdu wezîr bangî Keçelokî dikin û jê ra dibêjin, em şertê te yê diduyan jî qebûl dikin. Keçelok ji serxizmetkarî ra dibêje, mora we heye? Serqewraş dibêje erê, heye. Keçelok dibêje, morê têxe nav tenûrê, bila sor bibe. Serxizmetkar diçe, mora Xana Leterê di agirê tenûrê da sor dike û tîne. Herdu wezîr şelwerên xwe derdixin û qûna xwe belût dikin. Keçelok mora Xana Leterê li qûna wan dide. Bêhna goştê kizirî bi ser aşxanê dikeve. Keçelok pêncsed zêrê xwe jî ji wan digire, hinekî diravên din dide serxizmetkarî û di wê seatê da derdikeve rê.

Derdora nîvro digihîje ser kaniyekê, hespê xwe av dide, serçavê xwe dişo û li bin siya darê xew ra diçe. Bi vîçevîça çûçikan re ji xew şiyar dibe. Hew dinêre reşmarek bi darê ve hildikêşe ber bi hêlîna çûçikan. Şûrê xwe dikşîne û reşmarî perçe perçe dike û cardin xwe li binê darê dirêj dike. Dê û bavê çivîkên ser hêlînê tîn. Çêle, buyerê reşmar û yê binê darê ji wan re dibêjin. Ew jî dest bi çivçivê dikin û nahêlin Keçelok razê. Dê û bavê çivîkan bi hev ra qisa dikin. Keçelok jî guhdarî dike. Dêçivîk ji ya bavçivîkê re dibêje:

“Ev ê ku li binê darê xwe dirêj kiriye, zaveyê Padîşahî ye. Padîşah kor bûye û li gorî kalepîrekî dermanê çavê Padîşahî Gula Keskezer e. Ji ber wê, ew ji bona Gula Keskezer bi çiya û baniyan ketiye.”

Bavçivîk jî dibêje.

“Gula Keskezer tenê li ser Çiyayê Spî, di nav baxçeyê Qeralê Qeşayê da hêşîn dibe. Baxçeyê Qerêl, li bêlana qoqê çiyê, li paş qesra wî de ye. Her babet, her reng gul û kulîlkên çar demsalan li wê derê hêşîn dibin. Gula

Keskezer, ne zivistan û ne havîn dizane, her tim ew ter e. Yên ku li dorçaraliya baxçê ne, direwîn in, yê ku di navenda baxçê de ne, rastîn in. Berê wan her tim bi royê, ber bi tavê ye. Tav li kîjan aliyê be, berê xwe didin wî aliyê. Navika wan sor, perekê wan kesk û perekê wan zer e, ji her tewir derd û kulan ra derman in.

Dora çiyê gelî û newal in. Berf û qeşa, sal donzdeh meh ji ser çiyê kê nabe. Tu riyekê ku mirov xwe bigihîne diyarê çiyê tune. Bilî çîvik û çûçikan, heya îro tu beniyekî Xwedê derneketiye diyarê wî çiyayî. Di binê newalekê de selebek heye, encax mirov ji wir dikane hilkişê ditarê çiyê. Ejderhayek Qerêl, bîst û çar seatan li ber devê selebê dipê û rê nade ajal û mirovan. Lêvek wî li binê ezmana û lêva din li ser erdê, gava radikeve jî çavê wî vekirî ne û hişê wî li sêrî ye.”

Ya din dibêje.

“Vî zilamî qencî bi me kir. Ew marê bêbext kuşt û çêlên me ji mirinê rizgar kirin. Em ê jî qencyek pê bikin. Em ê her yek ji baskê xwe pûrtek biweşînin. Bila wan herdu pûrtekan di paşila xwe da veşêre. Li ber devê selebê, gava wan di hev bide, Ejderhayê Qerêl dê bixewire û bîst û çar seatan şiyar nebe. Wê şûn da êdî karê wî hêsa dibe. Gava Gula Keskezer ket destê wî, bila perek kesk daîne ser çavekê Padîşahî û perekê zer daîne ser çavê din , seatek şûn da dê herdu çavên Padîşahî vebin.”

Wê gavê Keçelok galgalên çîvikan ji sêrî heta dawiyê fam dike û di hişê xwe de digre. Radibe ser xwe, cotên pûrtekan dixê paşila xwe û berê xwe dide bakûr, heft şev û heft rojan, bi şev radikeve, bi roj dajo, ji çiya û newalan, gund û bajaran dibihure û digihîje Çiyayê Spî.

Qoqa çiyê di nav ewran da xwuya nake. Ji şewqa qeşa û berfa li ser çiyê, çav venabin. Cendekên mirovan û berateyên ajalan bi ser wan da daçiqilandî, lat û ferşên sertûjik mîna rimên şerûdan li ezmana dinêrin.

Refên sîsalk û qertelan li ser term û berateyan, qîjeqîja wan di gelî û newalan da deng vedide.

Keçelok bi sawê dikeve, lê veger tune, dê çawa vegere? Vegere jî rizgar nabe. Padîşah wî efû bike jî, dê Wezîrê Milê Rast û yê Çepê dev jê bernedin. Qasê bêhnek li ber kaniyekê rûdine, nan û penêrê xwe dixwe, ava hênîk vedixwe, serçavê xwe dişo, xwe dide hev û radibe.

Li serê çiyê zivistan, li nav daristanê buhar e. Di nav daristanê da, her dareke ku qurmên wan bi qasî bedena deh kesan qalind, bi qasî minareyan dirêj xwuya ne. Ne rê û ne jî şiverê heye. Cur be cur giha û histrî, bi gulî û çiqilên xwe, darên qelaptî û şikestî, li ser rê û neqeban bûne asê, tu beniyekê Xwedê nikane di ser ra derbas bibe. Gelî û newalên bêser û bin, çemên kur û şîpên bilind rê nadin.

Keçelok hespê xwe li devê daristanê girê dide, şûrê xwe ji qevdê dikşîne û dikeve nav daristanê. Bi bal dimeşe. Şûrê xwe li gulî û çiqilan dide û gav bi gav ji xwe ra rê vedike. Çiqas rê digire, ne ew zane û ne jî em dizanin, bîstek şûn da bêhn lê diçike, xwûdan di eniya wî de mircanan tîne holê, li aliyê rastê çavê wî bi darekê qurifî dikeve, li ser rûdîne, xwêdana serçavê xwe pak dike, kidika avê ji pişta xwe vedike, qultek vedixwe û kidika xwe cardin li pişta xwe girê dide. Ji nişkave, dara li ser rûniştiye dilive. Keçelok ji ciyê xwe hilo dibe û bala xwe dida darê ku çi bibîne, dara ku li ser rûniştiye ne dare, marîjokek tirtire, pişta wê mîna qurmê daran qaling û hêşk, keftalê wî mîna satorên qesaban tûj, çavê xwe vekiriye û li dora xwe mêze dike. Keçelok, fersenda revê nabîne, bi qemçika marîjokê ve lingê wî ji erdê qut dibe û bîst gavan wê da, li ser tûmik û dirîkan tê xwarê. Qasî bêhnek tê nagihîje çi bi serê wî da hat, lê zû xwe dide hev. Marîjok xwe digihîne wî, qemçika xwe cara diduyan lê dide, Keçelok, xwe ji ber dide alî. Gulî û çiqilên daran di bin derba qemçika marîjokê da dişkên, mar û mişk, kurm û kêzikên daristanê belawela dibin, çîvik û teyrên ser daran

bi qîjeqîjê difirin. Lingê Keçelokî dişemite û li ser piyê xwe yê rastê gêrî nav çalekê dibe. Keçelok hîna piyê xwe mist dide, marîjoka tirtire li ser devê çalê peyda dibe û devê xwe yê tevşo vedike, gilêz ji devê wê tê. Keçelok natirse, dest davê şûrê xwe, milê wî teviziye, bûye mîna kulav, şûr pê nagire. Ciyê revê jî tune, dê çi bike? Çavê xwe digire û xwe ji mirinê ra amade dike.

Li qoziyekê din, Ejderhayê Qeralê Qeşayê, pawanê selebê, bêhna mirovan girtiye û hatiye xezebê. Li çarnekalê xwe difitile û diore. Terq li ajalan dikeve. Qîrîn û qarîna jîndarên bejayî û qîjeqîje firendeyan, xelek bi xelek li nav daristanê belav dibe. Keçelok li nav çalê, Marîjoka Tirtire li ser devê çalê, di ciyê xwe da diqerisin. Xumînek nediyar, gav bi gav zêde û nêzîk dibe, mîna ezman biqelişe, dar û berên li dora çalê diqelêşe û aferîdên daristanê jê dertên, garana, gergedan, şêr, pêling, rûvî, gur, pezkovî û berezên terq lêketî mîna xubarê ji ser çalê derbas dibin, Marîjoka devtevşo, rihîstînê Keçelok, di bin tapanên fîl û gergedana da dihencike û dimire.

Keçelok bi lez û bez ji nav çalê derdikeve û xwe li orîna Ejderhayê digire. Çuqas dihere em nizanin, lê demekê şûn da xwe digihîne ber devê selebê. Ejderhayê Qerêl li ber devê selebê dere û tê. Serê wî mîna tehta aşê, dest û piyên bi pirçikî, xof li dilê mirovan radike. Keçelok xwe bi erdê ve dizeliqîne û bi kaşkaşî hildikêşe ser devê selebê.

Ejderha bêhna wî digire, li çardoraliya xwe dinêre, tişteki nabîne. Li paş xwe vedigere, li ser devê selebê, çefiya reşbelek a Keçelokî bi ber çavê wî dikeve. Çend naperokan diavêje Keçelokî, ciyê Keçelok lê, bilind e, naperokên Ejderhayê nagihîjin wî. Ejderha dinêre nabe, dareke qerese bi rîç û rîçalan ji erdê radikêşe, ji xwe re dike çov û diweşîne bi ser Keçelokî da, lê cardin bi ser nakeve. Keçelokî, xwe tevizandiye, ji tirsan nediwêre xwe bileqîne. Kef bi devê Ejderhayê dikeve, çav lê sor dibin û dest bi orînê

dike. Oriniyek wisa ku dar û daristan tev diheje, lat û ferş, berf û qeşeya serê çiyê bi ser Keçelokî da tên xwarê. Keçelok ji ser devê selebê gêr dibe û li ser piştê dikeve ber tapanê Ejderhayê. Ew tapanê xwe dide ser sînga Keçelokî, hew maye ku mîna kêzêkan wî di bin tapanê xwe da bipelixîne, pûrta çivîkan tê bîra Keçelokî, bi etra canê xwe dest diavêje paşila xwe, herdu pûrtikan ji bêrîka xwe derdixe û di hev dide. Ejderha, weke gurzek li serî ketibe, dikeve erdê û di xew ra diçe.

Keçelok radibe ser xwe, toz û gemara xwe dawdişîne û bi lez û bez dikeve nav selebê. Hundurê selebê reşetarî ye, çavê mirovan tişteki nabîne, li hinek ciyan serbijêr, li hinek ciyan qiyame, li hinek ciyan dibe fireh, li hinek ciyan teng e. Hêdî hêdî çavê Keçelokî hînê tariyê dibe, geh bi çarpiyan, bûlikan, geh xwe xwar dike, geh bi dîwarên selebê ve hildikêşe jor û serê sibê, wexta bangê, xwe digihîne serê çiyê. Li dora qesra Qerêl ne pawan û ne jî çavdêr xwuya dikin. Qeralê Qeşayê ji ciyê xwe û ji Ejderhayê xwe bawer e, kî dikane xwe bigihîne qoqa Çiyayê Spî? Temamê neferên qesrê di xew da ne. Keçelok bi gavên sivik û çipik berê xwe dide paş qesrê, li aliyê başûr xwe digihîne baxçeyê gulan. Li dor baxçê, gulên keskezer yên direwîn û di navenda baxçê da, gulên keskezer yên rastîn di bin tîrêjên tava serê sibê da, bi sira bayê re xwe mîna keçikan li ba dikin. Keçelok çaviyekê heqîba xwe bi yên direwîna û çaviya din jî bi yên rastîn dadigire û xwe bera nav selebê dide. Ji bîst û çar seatan, donzdeh seatên wî bihurîne û donzdeh seatên wî mane. Beriya ku Ejderhayê Qerêl şiyar bibe, divê ji çiyê dakeve û ji daristanê derkeve.

Keçelok dibe teyr û difire, bi bayê bezê ji seleb û daristanê derdikeve, siwarî hespê xwe dibe û berê xwe dide Xana Leterê. Riya heft rojan di sê rojan da diqedîne.

Wezîrên Milê Çep û yê Milê Rastê fêlbaz in, eger Keçelok têkeve ber destê wan, dê wî bikujin. Xwe nîşanî wan nade. Li çayxaneyekê nêzî Xana Leterê

rûdine û xeber dişîne ji serxizmetkarî ra. Serxizmetkar tê, Keçelok gulên direwîn ji heqîba xwe derdixe û dibêje, “van gulan bide herdu wezîran û ji wan ra bibêje, bila bibin ji Padîşahê xwe ra”. Hin diravên din jî dide serxizmetkarî û bi dizî vedigere mal.

Gava serxizmetkar gulan dide wezîran, ji kêfan hiş li serê wan namîne, Keçelokî ji bîr dikin. Xwe bi xwe dibêjin, qey ew dizekî pîs û heram bû, çavên wî li zêran ket, lewra ew me hew dibîne. Pêncsed zêrê ku ji me girt, besê heft bavên wî ne. Qasîdan bi rê dikin, dibêjin zû xebera xêrê bigihînin Padîşahê me û jê ra bibêjin, vaye wezîrên te Gula Keskezer anîne.

Bi xebera xêrê, Padîşah dilşad û bextewar dibe. Ferman dide wezîr û wezaretan ku dîlan û daweta heft roj û heft şevan li dar bixin. Lejneyek sîwarî bi def û zirne dişînin pêşiya Wezîrê Milê Çepê û yê Milê Rastê. Temamê nişteci, leşker û esnafên Kelayê dikevin nav tevgerek wisa ku qet pirs mekin. Jin û qerwaş xwarinê amade dikin, hinekên din birc û dîwarên kelayê dixemilînin, her kes cil û bergên xwe yên herî pak û xweşik li xwe dikin, keçik por û destê xwe hene dikin, xort riyê xwe traş dikin, simbêlan ba didin. Kuçe û kolanên nav Kelayê sê caran bi ava germ, sê caran bi ava sar dişon. Şerûdên Padîşahî hespên xwe tîmar, pêlavên xwe boyax dikin. Şûr û mertalên xwe pak dikin û dibriqînin. Koçek, sazband, hunermendên cur be cur, dengbêjên navdar û nenavdar derdikevin nav kuçe û meydanan. Herî zêde Padîşah kêf dike, dê çavê wî vebin, dê cardin ronahiya dinyayê bibîne.

Wezîrê Çepê û yê Rastê bi def zirne, bi reqîn û teqîna top û tivingan digihîjin Kelayê, Padîşahê kor ji ber wan radibe ser piyan, nişteciyên Kelayê yên ku hilkêşiyane ser xanî û dîwaran, yên ku li meydanê civiyane zilxit û li çepikan didin. Herdu wezîr ji hespên xwe dadikevin û li ber Padîşahî çog dişkînin. Hekîm û loqmanên Padîşahî heqîba gulan ji destê

wan digirin, perek kesk datînin ser çavekê Padîşahî û pera zer datînin ser çavê din. Kelecana Padîşahî derketiye qatê ezmanan, dilê wî mîna defa mitriban digurpe. Seatek temam dibe, hekîm û loqman perên Gula Keskezer ji ser çavên Padîşahî radikin, meydan bêdeng û her kesî bala xwe daye Padîşahî. Padîşah hêdî hêdî çavê xwe vedike, şevetariya li ber çavê wî wenda nebûye, carê du cara çavê xwe mist dide û li dora xwe mêze dike, na, her şevetarî ye.

Wê gavê Keçelok, siwariyê hespê kêhil, bi çargavî dikeve hindur, hefsarê hespê dişidîne, hespê wî radibe ser pêdarê û radiweste. Heqîba xwe ya bi gulên keskezer dagirtî dide hekîm û loqmanan û dibêje, îcarê van gulan biceribînin. Hekîm û Loqman bi lez û bez pelek kesk datînin ser çavekê Padîşahî û pelekê zer datînin ser çavê dinê. Seatek şûn da Padîşah çavê xwe li ronahiya dinyayê vedike û digihîje mirazê xwe.

Keçelok çîroka herdu wezîran ji Padîşahî ra dibêje, wezîr hêrs dibin û êrîştî Keçelokî dikin. Dibêjin, ev dizê pîs û heram viran dike. Wê gavê Keçelok dibêje, yên vira dikin, ne ez im, şelwerê wan ji wan deynin, wê gavê hûn ê bibînin kî direwan dike. Padîşah fermanê dide, dest û piyên herdu wezîran pê digirin û şelwer û derpiyan ji wan datînin. Li ser qûna wan, mora Xana Leterê xwuya dike. Padîşah wan davêje zîndanê û ji Keçelokî û qîza xwe ya biçûk lêborînê dixwaze.

“Min bîr û baweriya xwe bi şelaf û riyakaran anî. We, ne tenê perdeya li ber çavê min, perdaya li ber famdarî û zanetiya min jî rakir”, dibêje.

Wê gavê Keçelok jî, kumika ji çermê karikan, ya ku berevajî bi serê xwe da kiriye, ji serê xwe datîne û nasnameya xwe eşkere dike. “Ez şewermendê Padîşahê Kellarastiyê bûm”, dibêje. Gelo hûn dizanin ji bo çi navê wê Kellarastiyê bû?

Yên li wir dijiyan, direw çi bû, nizanîbûn. Direw, dirûtî û bêbextî, di nav xelkê da hest û helwestên şermezariyê bûn. Padîşahê me nexaş û nîgarê

dadwerî û rastiye bû. Bi wî re, çî dewlemend û çî feqîr hemû hevvelatî wek hev û xwediyê rewa û dadweriyê, xwediyê ray û azadiya xwe bûn. Kesî nikanîbû li kesî neheqî û çavsorî bikira. Nakokî û pirsegirêkên rojane, her babet şer û gelşên civatê, ji aliyê dadgeh û dadwerên bêteref dihatin çareser kirin. Bertîl û gendelî çî ye kesî nizanîbû. Di tevayiya Kellarastiyê û herêmên bin desthildariya wê da, hevvelatîyên birçî, tazî û bê xanî tune bûn. Her kes bi star û ewleyî bû. Tirsal mal û can, ji bo wan hesteke nenas bû. Padîşahê me tim û tim digot, “desthildariya Kellarastiyê li ser sê stûna ava bûye, azadî, wekhevî û biratî. Roja ku ev stûn qels bibin, yan jî bîn helweşandin, em ê têk biçin”.

Xwedê sê law dabûn Padîşahê Kellarastiyê. Gava Padîşah çû rahmetê, lawê wî yê mezin derbasî şûna wî bû, yê navînê bû Wezîrê Milê Rastê, yê piçûk jî bû Wezîrê Milê Çepê. Birayê mezin yê ku bûbû Padîşah, roja ewlî, pergela dadgeh û dadweran xira kir û ji holê rakir. Got, “heq û huqûq çî ye û çawa dibe, tenê ez dizanim. Çî hewcedarî bi dadgeh û dadweran heye?”

Êdî Padîşahê Kellarastiyê şûna dadgeh û dadweran girt, bi fermanên daliqandinê, dest û pî, poz û guh jêkirin, çav korkirin, bi kevirkirinê jin, bi qamçîkirinê mêr kuştin, Kellarastiyê kir mezbexane.

Salek şûn da birayê navîn, yê ku bûbû Wezîrê Milê Rastê, derket huzûra xelkê û got.

Mirovên xizan, nezan û bîndest çawa dibin xwedî ray? Ferman derxist, got bila her kes li gorî mal û milk û erka xwe tevbigere û qîsa bike. Çiqas hevvelatîyên xizan hebûn, zimanê wan da jêkirin. Got, gava hûn xwediyê raya xwe nebin û mafên we tunebin, hûn ê ziman çî bikin? Dor hat lawikê piçûk, yê ku bûbû Wezîrê Milê Çepê, sala sêsiyan îcar ew derket huzûra xelkê. Tiştên ku wî kir, tu kesî nekir. Çawa derket ser text, fermanek da:

“Qîzên çardasalî li heremê, xortên çardehsalî di artêşa Kellarastiyê da divê ji me ra xizmet bikin. Li kuçe, kolan, meydan û daireyên dewletê, divê peykerên me hersê birayan bên danîn û li eniya hevvelatiyan, mora Padîşahî bê dags kirin. Rojê sê caran, çi piçûk û çi mezin, divê li ber qesra min bicivin û bi dengê bilind çar caran biqîrin.

‘Her bijî Wezîrê Milê Çepê’

‘Wezîrê Milê Çepê her tişt e, em ne tişt in’

‘Wezîrê Milê Çepê bi namûs, em bê namûs’

‘Wezîrê Milê Çepê jiyan e, em giha ne’

Her kî li hemberî vê fermana min derkeve, dê bi zar û zêçên xwe tev bê kuştin.”

Erê, Kellarastiyê bû Kela zilm û zorê. Her sê bira bûn dijmin û celadê mileta xwe û nivê miletî qir kir. Her kesê dengê xwe bilind kir, telef bû. Yên man jî ji tirs û xofa kuştinê serî li ber wan danîn. Li hember vê yekê, ne tehmûl û ne jî sebra min ma, ji şevan şevêkê min agir berda cebirxaneyê qesra Padîşahî û birayên wî û ez revîm. Her sê bira jî di nav da, qesir firiya hewayê û bi erdê ve dûz bû. Min xwe gîhand welatê we, li gundekî nêzî kelayê, min ji xwe ra xaniyek lê kir û ez ketim nav. Ji wê rojê pê ve, min ji xwe ra soz da ku carekê din ez ê xwe nêzî desthildaran nekim. Lêbelê jiyan, pirî caran li gorî kêfa dilê mirovan naçe. Teyra Siûdê sê rojan li ser hev fitilî fitilî û dawîya dawî hat li ser serê min venişt! Lêbelê tu bi min qayil nebûy, kêfa te ji min ra nehat. Herwiha, eger niha tu ji min bipirsî, ez ê bibêjim, qasî ku qîza te ji min hez dike û bi min bawerî tîne, ez jî ji wê hez dikim û bawerî bi wê tînim. Ne ji bo xatirê te, lê ji bo xatirê hezkirina wê, ez ketim pê Gula Keskezer. Çavên te vebûn û dinya li te bû ronî, bila Xwedê emrekê dirêj bide te. Tu li mala xwe, em li mala xwe.

Hew li ser van gotinên Keçelokî, hêsir bi çavên Padîşahî dikevin. Dibêje; “Keçeloko, delalo, ev dilsozî û ev dilpakiya te, ev dirustî, fena barana

biharê dil, rih û mêjîyê min şûşt û paqij kir. Berxwedar û bextewar be!
Eger tu qebûl bikî, ji niha şûn da, tu lawê min î û ez jî bavê te. Ji welat û
miletê me ra, padîşahekî fena te sed carî misteheq e. Ji îroj pê ve, tu
padîşah û ez şêwirmendê te.”

Keçelok, xwe virda avêt, wirda avêt, Padîşahî dev jê ber neda. Keçelokî li
jina xwe mêze kir, jin hat wî hemêz kir, ramîsanekî bi eniya wî ve da û di
guhê wî da got, “eger tu bi wîjdanê xwe bawerî tînî, bi ya bavê min bike.”
Wî jî porê jina xwe ramîsa.

Çîroka me li diyaran, rehme li dê û bavê xwende û guhdaran.

2012.03.10

**

Mendo Axa

Weşandin: 02/11/2012 , Paşa Brodrêj

Di salên 1960î de, ji derveyî çend axayên gundên doralîya Swêregê, tu
qeweta axayekî tunebû ku ji xwe re traktorekê bikire. Piraniya nişteciyên
gundan, cotkarên axê bûn, gundiyan din yê ku cotkarî ji destê wan
nedihat, bi karê gavanî, şivanî û bexçevaniyê ve mijûl dibûn.

Bi cotkariya ga û hespan, bi xwedîkirina çend dewaran yan jî sed mîhan,
hatinek zêde ji bo axayan çênedibû. Bi qewlê swêregîyan piraniya axayan,
“axê şamikan” bûn, yanê halxirab bûn.

Axayê gundê Kevrokê Mendo Axa û axayê gundê cîranê wî Xelo Beran ji
vê beşê bûn, bi wê cudatîyê ku gava koçer dihatin, ji bo demeke kurt be
jî rewşa wan xweş û geş dibû.

Di payizan da, koçer ji çiya û zozanan dadiketî deşta Qerecdaxê. Hinekan
berê xwe didan başûrî û hinek jî dihatin aliyê Swêregê. Her payizê, bi
hatina koçeran çavê Mendo axa û cîranê wî yê Xelo Beran ji kêfan
diçirûsîn. Erdê wan ê çêrê, fireh û pir bû. Kirêyeke xweş ji koçeran digirt.

Zatî xêra wê kirêyê neba, nikanîbûn debara xwe bikirana. Her sala ku koçer dihatin, kirêya xwe pêşîn didan. Mendo Axa û Xelo Beran ji kêfan bi ezmana diketin. Pêşî, deynên xwe yên li cem qesêb, beqal, aşxane û qehwexaneyên Swêregê paqij dikirin (Divê bê gotin, ji deynê xwe re sadiq bûn). Dû re, ji zarokan re pêlav, kinc, ji malê re xwê, şeker, gazyaxî û hwd. dikirîn. Bi perê mayî jî zarokên nav malê sunet dikirin, xortên balixbûne dizewicandin, keçên balixbûne jî bûk dikirin.

Wê payizê gava koçer hatin, Xelo Beranî kirêya xwe ji wan girt û lawê xwe zewicand. Mendo Axa bi kêfxweşî û dilxweşiyê çû daweta lawê dostê xwe. Mendo Axayî ji şên û şayîyan, ji dawetan hez dikir, hele gava araq jî peyda bibûya, heta saeta dawiyê ranedibû. Gundî û cotkarê wî Hesênê Çeqo, bexçevanê wî Eboyê Keftal jî weke peyê wî, bi wî re çûn.

Hîna Xwedê li Mendo axa nehatibû merhemetê, bûbû bavê sê qîzan, lê tu lawikek ji wan re çênebûbû. Birîna wî ya kûr jî ew bû. Ji ber wê yekê, gava diçû derekê, şûna lawan gundiyên xwe bi xwe re dibirin. Mendo Axayî, her tim palisqeyek çermîn li piştta xwe girêdida. Du qewlik bi palisqeya wî ve hebûn, di qewlika hêla çepê de demançeya wî, di qewlika hêla rastê de kêra wî.

Sê roj û sê şev şûn de, di saeta dereng de, Mendo axa bi halekî serxweş vegeya mala xwe. Bi qarqar û borebora wî, neferên malê bi telaş û tirs ji xew rabûn. Jina wî Zîno li pêş, ling tazî, her sê qîzikên wê li pey, bazdan ber deriyê hewşê. Hesênê Çeqo û Eboyê Keftalî, Mendo Axa ji hespê daxist û her yek ket bin piyekî wî. Êsoyê gavan bi çavê xulmaşî xwe gîhand wan.

Mendo Axa li ba dibû, nikanîbû li ser piya rawestiya, pitepita wî bû, gêriz bi dêv ketibû, ji nişka ve, xwe ji nav destê Hesênê Çeqo û Eboyê Keftalî xelas kir û dest avêt demançeya xwe, lûleya demançê ber bi hewayê kir, li pey hev, çar caran pêlî tetikê kir, teqîna demançê di şeva tarî de deng

veda. Zînoyê, her sê qîzikên xwe dafî paš dîwarê hewşê kir, Mendo Axayî devê demançê zivirand ser Êsoyê gavan, Êso bû mîna zehferanê û hejiya.

-Law Êso! Ka de ji min re bibêje, ez axa me yan na!

-Ew çi gotin e ez qurban! Tu axa û begê me yî!

-Ez axa û begê çi me law! Bê pişkulên pezan û erdên bêxwedî ez axayê çi me?

-Ez heyranê te bim Axa! Wer mebêje! Em gişk xizmetkarê ber destê te ne!

-Ew zirzopên swêregiyan bi cîpan hatin dawetê û çewalek pere li ser zafê reşandin. Ma ez jî ne axa me laww? Ka cîpa min! Ka perê min! Li pey her yekî, xortên mîna qereseyan, li ser qûna wan demançê daliqandî... Zîno û Zînooo! Hewar Xwediyo!

-Axayo delalo, qurbana te bim! Gund li me rabû, her kes temaşeyî me dike, zarok ditirsin, ka were hindur, got Zîno û destê xwe avêt piyê wî.

-Zaro maroyê min tune Zînooo! Ev sê roj in, paye û forsên wan zirzopan ez teqandim û behecandim! Ma qey ez nizanim ew çito zengîn bûn? Ma qey pere ji ezmanan nabarin! Gişk diz in, sibe heta êvarê pez û dewarên xelkê didizin.

-Te ji min re kevir barand Xwediyo! Te ne law dan min û ne jî peyayên xurt! Ka ew Temo û Leşko li kû ne?

Sawek giran bi Temo û Leşko ket (Temo lawê Qefoyê şivan û Mihemedê Leşko jî lawê Êsoyê gavan bû, herdu jî zarok bûn, li nav mala axê, weke berdestkê Mendo Axayî bûn), bi dilgurrpînî nêzîkî wî bûn.

Mendo axayî, destê xwe yê rastê da ser milê Temoyî, demançe hêja di destê wî de bû û yê çepê ser milê Leşko. Çavên wan li ser demança Mendo axayî zok bûbûn, ruh ji wan kişiyabû.

-De ka binêrin! Peyê min ev in! Navê yekî Temo, navê yekî Leşko ye. De ka hela ji min re bibêjin, ez ê çito axatî bikim hiii! Çito, çitooo? Na naaa! Ez ê xwe bikujim! Qiriya û demançeya xwe bi serê xwe ve danî.

Hesenê Çeqo, Eboyê Keftal, Êsoyê gavan û Zîno, bi hev re tev bi çeplê Temo û Leşkoyê girtin, ew dafî kêlekê kirin û xwe avêtin ser Mendo Axayî. Êsoyê gavan û Zînoyê destê wî yê ku demançe tê de, qefand û ji qoqa wî dûrxistin. Her çi kirin nikanîbûn demançê ji nav lepê Mendo axayî derbixînin, bêçiyên wî wekî qayişê li ser demançê şidiyabûn. Qasî bîstek ber hev dan, hevdu birin û anîn. Mendo Axayî, destê xwe ji nav lepên wan xelas kir û careke din devê demançê da serê xwe.

Êsoyê gavan û Hesenê Çeqo ketibûn erdê, ji erdê pengizîn, destên Mendo Axayî careke din zevt kirin û ji serê wî dûrxistin, di heman demê de Mendo Axayî pêlî tetikê kir, demança wî sê caran ser hev teqiya, derbên wî gişk vala çûn. Careke din pêlî tetikê kir, bê cingînîyek vala deng ji demançê derneket. Derbên wî xelas bûbûn.

Mendo Axayî xwe avêt erdê û fena zarokan dest bi giriyê kir. Dest û piyê wî pêgirtin, birin eywanê. Hema li eywanê, Zînoyê balîvek danî bin serê wî û lihêvek avêt ser, berdîna bila li eywanê rakeve, êdî heta sibê ji xew ranabe, got û bi qîzikên xwe re tev çûn nav ciyên xwe.

2012.10.31

**

Temo

Weşandin: 01/01/2013 , Paşa Brodrêj

Bav û diya min dibêjin, sala ku me ji gund bar kir em hatin Swêregê, xwedê tu dayî. Gava ez ji wan dipirsim, ka hûn ji bo çi hatin Swêregê, dibêjin gund ji me re nedibû, me xwe beşer nedikir, zikê me her tim birçî, piştta me xûz bû, xirecira navbera gundiyan rehetî nedida me. Axê gund jî ne axa, fena gurê birçî li dor me dihat û diçû. Heqê xwe zêde zêde ji me

digirt, di ser de jî çî karên giran hebana barê ser milê me dikir. Me dî nabe em hatin bajêr.

Bav û diya min, li rojavayê Swêregê xaniyek xirabe kirê dikin. Di wê demê da, nifûsa bajarê Swêregê ne pirr bû. Taxa ku mala me lê, ji bajarek zêtir dişibiya gund. Piraniya xaniyên taxê ji kerpîçan, kuçe ne kuçe bûn. Av û genda ku ji daşirên nav malan derdihat, rasterast diherikî nav kuçeyan. Wexta baran dibarî, mîz, gû, zîrça mirîşkan, pişkulên pezan, rêx û zibilê dewaran, her babet londerên çopê ji ber derî û dîwaran, bi ber ava baranê diketin. Kuçeyên taxê vediguherîn çala celbê.

Heft salî an heyşt salî bûm. Bavê min rojek ji min re got; 'ji îro pê ve tu yê bi min re werî.'

Wê demê, swêregiyên ku halxweş bûn, ji xwe re mangeyên şîr xwedî dikirin. Bi şev, mangeyên xwe, axur heba li axuran, axur tunebiya li hewşên pêş malê dihewandin, bi roj dişandin çêrê.

Siba zû, li ciyê benderan, xelkê mangeyên xwe teslîmî gavan dikirin. Yê ku karê gavaniyê dikir, naxira mangeyan derdixist derveyî bajêr, ciyê ku li çêre hebû, diçêrand û danê êvarê vedigerand ciyê benderan. Her kesî manga xwe digirt û dibir mal. Karê ku bavê min dikir ev bû. Ez jî bûm şopdarê wî. Zaruyên di emrê min da, zaruyên ku dê û bavên wan halxweş bûn, diçûn dibîstanê. Yên mîna min jî li kuçe û çolan tolaz tolaz digeriyan. Bi biryara bavê min, jiyana min ya beradayî dawî bû.

Her siba Xwedê, niha ji ku diçe nizanim, lê wê demê, rêya kevn ya gundê Babê, li paş taxa Xeyriyeyê, ji rêya Tuxtemirê vediqetiya, ji ber mezelên Babê, navbera rezan re dibihurî û digîhaşt gundê Babê, ji ser wê rêyê, me naxir dibir çêrê. Heta roj diçû ava, li derdora zinarên Helawikê, li dora çemê biniya wê, me naxir diçirand.

Bavê min ne yekî devbelaş bû, lê carcar gava dest bi pitepitê dikir, kesî nikanîbû rawestanda. Di derbarê her pirsê de, gotineke, fikreke wî hebû.

Nediçû mizgeftê, nimêj nedikir, lê dîn û baweriya wî bê kêmasî bû. Her cara ku zikê wî têr dibû, ji Xwedê re şikur dikir. Halê me yê xirab, rezîlî, belangazî, neçariya me hewaleyî Xwedê dikir û digot, 'Xwedê kerîm e, qey wê rojekê me jî derxe firehiyê. Yekî xwediyê merhemet, bi wîjdan, tu rojekê ezîyet li dewaran nekir. Naxira xwe, bi fîtik, bang û qîrinê dicivand ser hev, dixist rêzê, disekinand û bi rê dixist. Meriya digot qey bi zimanê hev qisa dikin û ji hev seh dikin. Li hemberî zarokên xwe jî dilhêşk nebû. Li me nedixist, qiseyên çors ji me re nedigotin. Li hemberî diya min, carcar bêhna xwe teng dikir, dimizmezî, lê destê xwe ranedikir.

Di wê payiza bêxêr da, ji bo piçek xwê, tiştê ku min ji bavê xwe nedipa, bi serê min de hat. Bavê min ê bi merhemet, bavê min ê bi wîjdan, ji ber çavê min winda bû, veguherî yekî zordar, hindik mabû ez yekî bikujim. Wê rojê, êvara dereng em gihîştibûn malê. Ji siba zû heya êvarê, li ber baranê tayekê zuha di kincên me de nemabû. Şilopilo, li ber bayê em qefilî bûn, me xwe bi zorê gîhandibû malê.

Tenê odeyekê me hebû. Me kincên xwe guherandin, li ber sifra xwarinê em rûniştin. Herdu xwîşkên min, Xezal û Gulşayê, temenê yekê çar ya din pênc salî, xwe dan kêleka min, rûniştin. Bavê min ji qutiya tûtînê, cixareyek pêça, hilmek kûr lê da, diya min savara bi aqîtê firingiyan, tevî qûşxanê danî ser sifrê. Pîvazekî hişk qaş kir, qelişand, du perçe danî ber bavê min, perçeyek ji xwe re girt, yek jî danî ber min. Ji tûjiya pîvaz, xwîşkên min nedixwarin.

Bavê min, bêyî gotinek bike, dawî li cixara xwe anî, heta wî destpênekira, me nediwêrî dest bi xwarinê bikira, bi bismîlahûrahmanûrehîm, pariya nanê xwe bi savarê ve dagirt, bir devê xwe. Ji birçîna zikê min qurequr dikir, keldemana ji savarê radibû, hiş li serê min nehîştibû. Min kevçiya xwe ya dar, bi savarê dagirt, devê min şewitî, çav li min sor bûn. Di wê

navberê da, bavê min, xwe ji ser sifrê paşve kişand, bi awirek sar ji diya min pirsî.

-Kejê, ka xwê ya vê savarê?

Parî di gewriya diya min de ma, bilez pariya xwe daqultand, herdu xwîşkên min xwe civandin serhev.

-Xwê!

-Erê xwê ya!

-Wele çi bibêjim, ne ku min xwê nexistê, lê..

-Xezal! Rabe here xwê bîne! Got bavê min.

Xezalê li nav çavê diya min mizekir.

-Xwê ya me nema, got diya min. Xwêya ku li mal hebû bes nekir.

-Qey te nikanîbû ji cîranek deyn bikira?

-Her ro duro ez qapiyê cîranan lêdixim, êdî merî ji fediya dikeve binê erdê.

-Ew çi gotine, qey ew jî nayên tiştan ji me deyn nakin!

Diya min keserek kişand, keneke xemgîniyê li serçavê wê veda û tefiya.

-Di mala me de çi heye ku cîran werin deyn bikin! Nermik got.

Qasî bîstekê deng ji bavê min derneket. Hêdîka dest avêt qutiya xwe ya tûtînê, qapaxa qutiyê vekir, li tûtînê mizekir, mîna ku dixwest cixareyek bipêçe, lê dev jê berda, qapaxa qutiyê girt û xist bêrîka xwe.

Ji van gotinan mexseda te çi ye Kejê? Got. Ma qey tu gazincên xwe bi min dikî?

-Ez, gazin mazinan li te nakim, tenê ez ji Xwedê gazincan dikim, got diya min.

-Çi zerara Xwedê ji te re heye keçê hii! Got bavê min.

-Zerara wî ji me re heye tune, ez nizanim, bes tu fêdeyek wî heta nuha ji me re nebû.

Eniya bavê min çiqirî, destê xwe avêt qulpên qûşxanê, qûşxane di destan da, serê xwe rakir, çavek li ser asraqên odeyê gerand, fena ku bi Xwedê

re qisan bike, “estafulah ya Rebî, tu guneyê vê kêmaqilê bibexşîne” bilêvkir û vegeriya ser diya min.

-Hey kafir qîza kafiran, tu bi çi cesaretî zimanê xwe dirêjî xwedê dikî, got û qûşxana savarê li ser serê diya min valakir.

Çiv ji diya min derneket. Qet li aliyê bavê min mêzenekir. Rabû ser xwe, çarşeva xwe ya şîn li xwe pêça, ji hundur derket. Ew çû şûnda, bavê min jî derket çû qehwê. Wê êvarê ez û xwîşkên xwe birçî raketin.

Wê şevê, diya min çûbû mala xwîşka xwe. Bê xwîşka wê, li bajêr kesek wê tunebû. Sibetirê vegeriya hat malê. Êvarê, li ser sifra xwarinê, dê û bavê min bi hev re qisenekirin, li rûyê hevdu mizenekirin. Di nav bêdengiyê de me şîva xwe xwar û em ji ser sifrê rabûn. Bavê min dîsa çû qehwê.

Neheqiya ku bavê min li diya min kiribû, ez pê êşiyabûm. Erê, ez hîna zaro bûm, hişê min nediçû ser her tiştî, min bi zelaî tişt ji hev venediqetand, lêbelê gere bavê min li diya min wer nekira. Miemala bavê min ne rast bû. Xedir tê hebû, min ev dît. Feqîrê heta êvarê xizmet dikir, li me dinêrî, ji destê wê çi bihata dikir.

Ji wê rojê pêve, dilê min ji bavê min sar bû, min xwe jê dûr girt. Heta ez mecbûr nebûma, min pê re qise nekir. Wexta ew li pêşiya naxirê dimeşiya, min xwe dida paş, gava naxir diçiriya, wî li aliyekî naxirê pal dida, ez li aliyê din bûm. Gava hewil dida xwe ku bi min re qisa bike, min cewaba wî nedida. Gava ez pir mecbûr dibûm, min serê xwe li ba dikir. Dubendiya me heta roja ku mangeyek ji naxirê wendabû ajot.

Wê êvarê, li ciyê benderan, her kesî manga xwe da ber xwe û çûn malê. Bê me û xwediye mangeya wendayî kes nema. Xwediye mangê jî yekî tewtewe, bejna wî evqas dirêj, qoqa wî bi ezmana diket. Me zêde hevdu nas nedikir. Ew jî nû hatibû Swêregê.

-Ka no mangeya min kotîdiro, got mêrêk.

Ez û bavê xwe li ciyê xwe qerisîn. Mêrêk li me mize dike û em jî li hev mize dikin.

-Ka va mangeya law!

-Ez çi zanim, bavo! Min got qey te jimartî ye!

-Gava min jimart, tamam bûn. Ma qey neket binê erdê! Em ê paşda vegerin, dibe ku ketibe nav rez mezan.

-La çi pilpila şima yo? Ez mangeya xwe pers kena, şima xwe miyandê pilpil kenê!..

-Bêhna xwe fireh bike bavê min! Em ê bi destûra Xwedê manga te bibînin. Li serê me qiyametê rameke ez heyran! Got bavê min.

-Ortê rojî de senî mange vinîbeno la! Qey şima qerfê xwe kenê?

-Bavê min, çavê min! Em ê ji bo çi qerfê xwe bi te bikin, got bavê min. Xwest mêrêk sinûx bike, lê havil li mêrik nekir.

-Ez çizana la! Şima sûkijî hemê sextekarê!

-Te dinya nediye, xêr e? Wendabûyina mangeyan tişteki ecib nîne. Niha em ê delalekî bi kuça xin, wê manga te bibîne. Ev çi beqabeqa te ye?

-Ez delal melalî nêzana! Manga xwe şima re wazena. Şima anê anê, niyanê edo çimê şima re veca!

Wexta mêrêk got, “edo çimê şima re veca”, bavê min xwe pênegirt.

-Dev ji vê gevezetiyê berde, birê min! Em ê manga te bibînin. Got.

-Geveze tiyê la, got mêrêk û gurmista xwe dawşand serçavê bavê min.

Bavê min gêrî erdê bû, çoyê destê wî pekiya aliyekî. Ji dev û pozê wî xwîn pijiqî, mîna sergêjan carek du car li dora xwe fitilî, rabû ser xwe, bi piyê xwe xwîna dev û pozê xwe pak kir, di bin çava re li dora xwe mize kir, ez bawer dikim li çoyê xwe digeriya, lê mêrêk firsend neda, ji paşve xwe gîhand, pêneke bi qewet li newqa bavê min da, bavê min tepeteqle qulibî erdê. Wê gavê, dinya li ber çavê min reş bû, min çi kir, çawa kir ez nizanim. Ji paş ve ez gîhaştim mêrêk, min kêra xwe ya desta di çîpê wî de

daçiqand. Borînek wisa bi mêrêk ket ku qet pirs mekin, ew qelefatê gran bi devûrû ket erdê, min lê da, çîp û kulêmeka wî min qulqulî kir. Ji aliyekî min kêr dikir û ji aliyê din jî ez bi ser de diqiriyam.

-Ma sextekarê haa!!! Ma sextekarê haa! Ma sextekarê haa!

Her cara ku min kêra xwe dadiçiqand, orîna wî erd û ezman diqelişand. Wê gavê bavê min, daf li min neda û ez dûr nexistama, sedî sed min ê ew bikuşta.

-Bênamûsê bê bêhisyet! Mîna meriya te qisebikira, ne dibû! Vê êvara Xwedê ji bo çî te bela xwe di me gerand hiii!

Bavê min got, pêînekî li kêleka wî da, mêrêk bû du qatî, qarqara wî hat birîn û hew deng jê hat.

-Xwe bilezîne lawo, mêrêk dimire!

Bi bayê bezê me berê xwe da mal. Wê êvarê û wê saetê, me qap û qacaxê xwe dan hev û em ji malê derketin.

Em çûn gundê Kevrokê, gundê Mendo axa. Bavê min got em ê biçin wir û me jî da dû, di tariya êvarê da, me da ser rêya Şerabtûlê, niha jê re dibêjin, rêya Bûcêx. Lê berê wer nebû, xelkê digot, rêya Şerabtûlê. Rêya ku di başûrê wê de diçû, rêya Hesenwêranê û ya biniya wê jî riya Gozlegê bû, ji ber taxa Serebê destpêdikir û ji ber mezelên sipî dibihurî.

Piştî kêrkirina wî mêrêkî, meriya digot qey barekê giran ji ser pişta min rabûbû.

Min ji bîra kir bibêjim, navê min Temo ye. Eger Xwedê qismet bike, carekê din ez ê ji we re behsa gundê Kevrokê û Mendo axa bikim.

2012.11.02

Paşa Brodrêj

**

Çêlkewên hustuxwar

Weşandin: 11/04/2009 , Enwer Karahan

Sibeheke hezîranê bû ku bayekî hênik xwe ji lata di ser şênîyên me re li rûyê mirovî radipelikand; tîrêjên rojê ji paş çiyayî ve xwe li derdawkên darên zeytûn û mişmişan radikişand. Min xwe di kozika li ser kaniyê kiribû qoncik û min li dengê wê kewê guhdarî fikir ku ew ji pala latê dihat. Min bi dîqet di qulikên kozikê re li rêya nêçîrê dinêrî ku ew bê ser avê. Ew bi teqil bû û ez bi sebir bûm. Me weha di ber hev de dida.

Di wê bédengiya li binê wê bilindahiyê de, bîhna gîha û deviyên bejî li ber sura bayî diket û ew nezarê ku di bin siya wê latê de di bin kimkimiya taswasekê de difetisî û bîhneke tûj li derûdora xwe belav fikir ku mirov ji ser hişê xwe ve dibir û xilmaşiyek bi yekî re çêdikir.

Ji nişka ve mêkeweke sûsik li ser avzê mî, li binya tûmekî xirnûbê xuya bû. Kewê du caran nikulê xwe di avê dakir û qirika xwe ber bi ezmên ve qiyame kir. Ew bû mîna pêşîra çepê ya keçeke naşî.

Min devê çifteyê di qulika kozikê re dirêj kir û min ew û niçikê li serê lûleyê kirin yek... Serê pêşîrê ricifî, reqisî û dû re perpitî.

Bi girmîniyê re çend perik bi hewayê ketin û dixaneke wek gilokeke jihevdeketî bi ber çavên min ket; dû re, bîhna bahrûdeke tûj tev li wê bîhna kovî ya binê wî zinarî bû û çemekî ji şîrê ji serê memikê keçekê herikî; ew tev li dimsa tiriyê mazrone bû û qirş û qalên gunehên navseretîya min bi xwe re herikand, ew bû berfdimskeke lewitî.

Ez bi awayekî duqatbûyî ji kozikê derketim û min ber bi termê kewê ve bazda. Ew li ser hêlekê ketibû û ling û bazikên wê xirxilî bûn. Berkurka wê wit î vala bû ku ew mîna lûlaveke derbûyî çilmisî bû... Min xwe daqûl kir ku ez rahêlim nêçîra xwe; min dît ku 10–12 çêlkew ji dora termê kewê bûn zîbeq û pekiyan, her yek bi hêlekê de pengizî û bi ber wî çemê şîrê naşiyê ketin.

Bêyî ku ez rahêlim kewa li erdê, min li wan temaşe kir û ez di bédengiya gomikên wî çemî de vegevizîm...

Çavên min û yên çêlkewekê ji wan çêlkewan ket hundirê hevdu. Çavên wê di çavên min de biriqandin, xirekek bi ser şîrê çemê keçikaniyê ket; wê xofeke bêhawe bi min re çêkir. Ez ricifîm. Qutifîm. Sar sekinîm.

Dû re, ew bi yek hilmê çû xwe di nav çaviya deviyêke hizîzkê de veşart. Min xwe li ber termê kewa li erdê bera ser tutukan da; min cixareyek pêça û agir pêxist; min gulpeke mezik kişand pişikê xwe û berneda...

Ez kûr çûm û li ber çavên min rewrewkek çêbû. Ez nizanim bê ez difikirîm yan jî min li wê nuxtaya xumam dinêrî ku ji wê kêliyê dûr bûbûm.

Bêyî ku ez rahêlim kewê, ez ji ber serê wê rabûm û min wê gavê, li ba xwe ahd kir ku ez ê nema nêçîrê bikim.

Ez bi bîstgavekî bi dûr ketim û min dîsa li dû xwe nêrî. Ew çêlkewên ku gavkek berê ji ber heybeta min baz dabûn, dîsa vegeyriyabûn ser termê maka xwe, bi nikulên xwe yên turûncî ew ditiktikandin.

**

Sîno bû efendî

Weşandin: 12/04/2009 , Bûbê Eser

Sîno xortekî ji Xozberiya gundê Dêrika Çiyayê Mazî bû û nuh zewicî bû. Li Xozberiyê tu karê ku wî bikira tunebû. Ji bona bikaribe ji xwe re karekî bibîne, debara mala xwe bike, mal ji gund biribû Diyarbekirê. Bi hêvîya ku karekî bikî, hatibû bajêr. Ji xwe re xaniyek kirê kiribû, mala xwe têde bi cîh kiribû. Lê kar dîtî, li bajarê Diyarbekirê ne weha hêsan bû. Ji ber ku rojê bi dehan kesên weke Sîno ji gundan dihatin bajêr. Sîno her roj ji xwe re li kar digeriya, lê tu kar bi destnedixist. Hêvî, bîr û baweriyên ku ew ê êdî ji xwe re karekî bibîne pêre kêmbû bûn. Wî fikir û nedikir nikarîbû tu kar bidestbixista, da ku debara mala xwe bikira. Ji hemû nas û dostan daw û doza kar fikir, lê bê fêde bû. Peryên ji gund teva xwe anîbû li ber qedandinê bû. Bi hatina Diyarbekirê poşman bû bû, lê êdî poşmaniyê tu

fêde nedida wî. Vegere wî jî zehmet bû, ji ber ku hemû hebûnên xwe yên gund firotibû.

Sîno her roj serê sibê ji mal derdiket, li kar digeriya, carina diçû hala sebze, (zêzewat) kamyonên tije dihatin û diçûn. Ji bona tijekirin û valakirina wan, kesî bangî wî nedikirin, ji ber ku mirovên wan kamyonan ji berê de dihatin amadekirin. Carina jî ew berbi kesên bi erebeyên destan ji xwe re fêkî difrotin diçû û ji wan dipirsî:

-Pismam, ma gelo ev kar çawa ye? Ez nû ji gund hatime, ji xwe re li kar digirim. Li kar digirim, lê tu karê ku ez ê bibînim tune ye. Gelo tu nikarî aqilekî bide min, alîkariya min bikî?

-Kuro tu jî weke me ev kesên li vir bi seden e, ji xwe re erebeyeke destan bikirî. Serê sibeyan were halê fêkiyên xwe bistîne, bi kuçên Diyaberkirê bikeve û ji xwe re dest bifirota sebzeyan bike. Wê ev kar ne gelekî qenc be, lê dikare îdare mala te ji tunejî çêtir, bike.

Piştî ku Sîno hate malê, li ser wê pêşniyara kesê erebecî, fikirî, ponijî û ew kar berbi serê wî jî çû. Ji ber vê bû, pereyên xwe yên mayî jimart, lê têra kirîna erebeyekê nedikir, loma bazînekî jina xwe Fato jî firot, erebeyeke xwe kirî. Kirîna erebeyê, mesref û îzna wê ya ji belediyê derxist, li ser wî bi bihayekî giran rûnîştibû. Lê wî digot: “Xem nîne, hela ez carekê dest bi kar bikim, ez ê deynê xwe hemûyan bidim”. Ew jî weke bi seden kesên din, serê sibeyan li halê hazir dibû, fîkiyê erzan ji xwe re dikirî dûre bi kuçê û kolanên Diyarbekirê diket û digot:

-Isot, îsoot, bacan, xiyar, taze ne, taaaze , eger ne baş be nekire...

Sîno jî weke hevalên xwe, bi zikekî têr dudên birçî fêrî vî karî bû bû. Destpêkiribû lê ji ber hin nezaniyên wî ya destpêkirina karekî weha, ew di bin dehyana de mabû, ne têrxwerina wî hebû, ne jî rehetiya wan.

Di salên heftêyî de, doza şoreşgerîyê li welêt gelekî bilind bû bû. Di warên burokrasiyê de gelek tîşt bi hukmê tirs û zorê bi destên xwendevanên welatperwer dihat kirin.

Birayê Sîno yê xwendekarê unîwersîtê Serdar, ji halê kekê xwe gelekî ne rehet bû bû, ji ber ku pênc zaroyên Sîno hebûn û îdara wan bi wî karê ku wî fikir nedihat. Meriv dikare bêje ku hema hema giş birçî bûn û bi serde jî kirêya xanî hebû. Serdar fikirî ku jî kekê xwe Sîno re dîplomeyekê bi rêya nas û dostan derxe da ku; bikaribe kekê xwe di daîreyeke dewletê de bi cî bike. Loma ew bi çend mamosteyên nas re axifî, piştî çend îmtîhanên formalîte, ji kekê xwe re dîploma xwendina serete ango ya bîngehîn (destpêk) girt. Dîsa bi rêya nas û dostan ew di bankeyekê de weke mustahdemekî (Xademe) bi kadro kir. Kêfa Sîno û mala wî ji ber vê yekê li cîh bû. Sîno di bankeyekê de bû bû efendî.

Piştî salekê, Sîno hate ba birê xwe Serdar û got:

-Birao, ji bona ku te ez kirim efendî sipas dikim, lê bi rastî min digot belkî efendîtî karekî xweş û rehet e, lê dema min li bankeyê dest bi kar kir, tê gihîştim ku karê efendîtiyê karekî zor û zehmet e. Nasên te gelek in, ma tu nikarî min bikî beg jî, çawa be dem dema we ye. Di vê demê de, hûn çawa bixwazin dikarin bikin, te ez çawa kirim efendî, weha jî tu dikarî min bikî beg.

Serdar got:

-Ma çima efendîtî gelek zor e?

-Belê belê, wele û bila zor e. Binêre ez ji te re nimûneyekê bidim. Ew mirovên li bankê kar dikin gazî min dikin û dibên: "Sîno efendî ji kerema xwe re vê nivîsê bibe ji Ramazan beg re" An jî dibêjin: "Sîno efendî tu dikarî binerî bê hela Emîn beg ji tûwaletê derketiye". Di vir de têgihîştim ku efendî ew kesên li paqîjî û li towaleta dinerin e, kesên din beg in. Loma ez dixwazim ji vê efendîtiyê xilas bibim. Ma tu min bikî beg wê çi bibe?

-Kekê min ev rehet e; lê bey kesên xwenda ne, ew hesaban baş dizanin, tu bi vî halê xwe bibî bey, tê zorê bikşînî.

-Na birê min na, ez ê bikaribin barê xwe hilgirim, ka tu dîplomaya Xwendegeha Navîn û ya lîseyê ji min re bistîne, karên din rehet e.

-Baş e, ez ê bi mudurê lîseyê ya qezê re qise bikim, ew him nasê min e, him jî hevlekî rêxistinê ye. Eger îmkan hebe ew ji min re nabê na!

Serdar bi wî hevalê xwe yê mudurê lîseyê re peyivî, berê dîploma Navîn dûre jî ya lîseyê ji kekê xwe Sîno re stend. Sîno ji efendîtiyê derbasî beytiyê bû. Bû xwedî kravat û cîlên xweşik û paqîj. Êdî wî ji banî Tahir efendî fikir, ewrak dida wî û bi awayekî jî xwe bawer, dîgot:

-Tahir efendî ji kerema xwe re van ewraqan bibe ji Cemal beg re.

Bi saya serê wan dîplomeyên ji bona xatir û dostaniyê, Serdar ji kekê xwe Sîno re girtibûn, him ew bû bû bey, him ji maaşê wî zêde bû bû. Êdî Sîno ji efendîtiyê azad bû bû. Ji karê xwe razî bû. Rojekê Sîno birê xwe Serdar vedixwîne malê. Ji wî re xwarinên gelek xweş çêkiri bû, çend şûşên bîra jî (avceh) danî bû ber wê xwarinê û jê re got:

-De fermo birayê min î delal, bi saya te ez gîhandim vê rojê û bi saya te em nanekî rehet dixwin. Em hemû ji te razî ne. Heta vir tu gotina min ji te re tu ne ye. Karê giran ji vir û pê de ye!

Serdar şaş mabû û li kekê nerî û got:

-Xêr e kekê min! çi karê zor! wê ji vir û pêde be?

-Birayê min heta vir her tîşt baş û delal e. Ma tu nizanî ku ez fêrî, bilindbûnê bûmê. Loma ez ji birayê xwe re dibêm, ma gelo bi xêr tê çi demê ji min re dîplomaya unuwersîteyê jî bigirî? Êdî ez dixwazim di bankeyê de bibin, mudur an jî şef.

Serdar bi awayekî matmayi lî wî nerî, kevçiyê xwe danî, qedeheke bîra vexwar, hêdîka di ber xwe de got: “Erê wele heqê te heye ku tu berî min unuwersîteyê jî biqedînî”.

**

Dema terez bariya!

Weşandin: 27/05/2009 , Bûbê Eser

Sînoyê bi henek û tinazên xwe, bi ken û şahiyên xwe, bû bû gula gundê Xozberiyê. Him ew mêrxwasekî tam û him jî henekçiyekî delal bû. Wî tim hay ji gotinên xwe hebû, ew ê li ku çî bêje. Lewra jî him bi henekên xwe û him jî bi gotinên xwe wî xwe li gund dabû qebûlkirinê.

Ew jî weke hemû gundiyan, her êvar li oda gund bû. Êvaran dema oda gund digeriya û kesên li wir behsa hin kiryar û bûyerên xwe yên leşkeriyê dikirin. Behsa ku wan çawa leşkerî kirine, çawa lêdan û îşkence didîtin, dikirin. Kesên ku bi Tirkî nizanîbûn, gelek zehmetiyên mezin didîtin. Loma şevbihurikên wan gelek caran li ser demên leşkeriyên wan derbas dibû. Her weha gundî fêr bû bûn ku carna bi wan serpêhatiyên dikiyan û carna jî ji ber wê zulma leşkerên romê keser dikşandin.

Lê çî dema behsa leşkeriyê dihat kirin. Hema yekî gotin ji devê ê din digirtin û qala leşkeriya xwe dikirin. Êvarekê dîsa ode gund geriya bû. Cihê rûniştinê têde nama bû. Gundiyan him çayên xwe vedixwarin û him jî gotin digerandin. Wê şevê weke gelek şevên bihurî, gundiyan behsa leşkeriyên xwe dikirin. Bi gerandina gotinan li ser leşkeriyê, hema yek car bûyereke leşkeriya Sîno jî hate bîra wî. Berê di berxwe de mizmigî lê vê mizandina wê bala gelean nekişandibû. Piştî ku xalê Şêx Evdo axaftina xwe qedand, hema Sîno yek ser xwe hinekî berbi pêşde da û got:

-Ka hela, hinekî rawestin! Ez jî îşev weke bi çûkekî we serpêhatiyeyeke xwe ya leşkeriyê bêjim. Eger bi destûra we be! Her çîqasî dengê nerazîbûnê bi hin gundiyan ket jî lê dîsa piraniyan wan bi serî hejandin in xwe, weke bêjin: belê dor dora te ye.

Loma rîsîpiyakî li Sîno nerî û got:

-De ka bêje! Tu îşev napeyîvî ye. Ka em binêrên bê çi hat bîra te ku te jî çekala xwe avêt nava çekalên cemaatê

-Bî xwedê dema we behsa mêranî canfîdayî ya leşkeran kir, Serbazekî min yê leşkeriyê hate bîra min. Çîroka wî gelekî xweş e. Her weha mirov bi saya wî tê digihêje ku Serbazê Tirkan çiqasî mêrxas in!

Kesekî din bi meraqdarî got:

-De ka zêde dirêj nek Sîno! dest pê bike û bêje!

-Ma ne hûn mirov rehet bernadin ku me re jî bi rehet bêje yabo. Û Sîno yê me dest pêkir.

-Weke hûn dizanên di dema min de leşkerî 24 meh bûn. Hîn 11 mehên min li leşkeriyê qediya bûn. Ji îzna min re mehek mabû ku ez ê li welatê xwe vegeyriyama, biçûma dîtina dê û bavê xwe...

Di vê navberêde Bedrano xwe negirt û got:

-Ji bona xatirê xwedê Sîno, zêde dirêj neke û ka wê mesela xwe û çîroka Serbazê xwe bêje lo, bes e, weh te em anîn ga.

Sîno mirovekî zane, tê gihiştî, henekçî û zana peyv bû. Bi temenê xwe yê biçûk wî gelek newalên asê derbas kiri bû. Dema wî dixwest titşekî bêje, diviya bû ku wî serî de destpê bikira da ku di gotinên wî de her kesek tê bighên. Loma wî xwe hinekî ji ber gotina Bedrano aciz kir, serê xwe hejand û got:

-Heyran me ne hûn nahêlin ku mirov bêje. De, serê we neêşînim. em di meha adarê de bûn. Wê rojê hinekî ewr hebû. Ji rewşa ewran dihate fêmkirin ku wê tişteke bibariya. Me talîma xwe qedand. Vêca dor hatibû ku mirovê çawa bi dijmin re şer bike. Dema dijmin êrîşê bîne ser me re, divê parastina li hember wan çawa be, didît. Serbazê me di nava me leşkerên feqîr de weke dîkekî dixuya. Tim behsa mêraniya leşkerên Tirk û li hember dijmin mêrxasiya Serbaz dikir û digot: `binêrin dema dijmin êrîş anî ser we, divê hûn qet ji wan netirsin û hûn jî êrîşî wan bikin da ku

ew ji ber we birevin. Leşkerê Tirk bê tirs e. Leşkerên Tirkan ji bona welatê xwe sînga xwe ji dijmin re vedikin. Natirse lê dijmin ditîrsîne`.

Bi wan gotinên wî porê serê mirov gij dibû. Hûn bawer bikin ku wê demê dijmin bi tank û topên xwe jî êrîşê me bikirana, meyê xwe ji ber wan neda alî. Lê hûn werin wê ecêbê ku ewr giran bûn, hê Serbazê me gotinên xwe neqedandibû ku terezek e weha bariya ku mirov nikarîbû çavên xwe vekira. Dîtina min dît ku Serbaz bi wirde û virde dest bi bazdanê kir. Ci û starî ji ber wê terezê nediketê. Wê reva wî bala min kişand ku ew mêrxasê berî niha bi qasekî çawa ji ber vê terezê direve. Bi vê fikirandinê ez hinekî mizmizîm. Tu nabê vê bala wî jî kişandibû. Piştî terez sekinî, Serbazê me xwe ji wê stara ku lê bû derxist. Berbi min de hat, li nêzîkî min sekînî û got:

-Sîno dema terez dibariya tu çima keniya? Min meraq kir!

- Qet! min got, lê tirsiyam ku ew ê ji ber wî kenê min tişteki bîne serê min. Lê wî got:

- Rast bêje tu çima keniya?

-Qomandarê min wele ne ji ber tişteki bû, ez jî nizanim çima? Hema weha kenê min yek ser hat.

Wî rewşa tirsê min fêhm kir loma bi dilsozê got:

- Ez soz didim ku tu maneye wî kenê xwe, niha ji min re rast bêje ez ê destên xwe li te nedim. Qet netirse û rast bêje.

Min baş fêhm kir ku heta ez vê rastiye angos sedema kenê xwe nebêjim wê tu rehetiya min tune be. Loma min jî cesareta xwe topî ser hev kir û xwe bi xwe got: Hema çi dibe bila bibe, ez ê ya rast bêjim û min bi deng got:

-Qomandarê min! berî ku terez bibare we behsa top û guleyên dijmin fikir ku divê mirov xwe ji ber wan nede alî. We digot ku di rewşên weha de divê mirov êrîşî dijminê xwe bike da ku wan bişkîne. Li gor wan gotinên we, bi serketina şeran weha dibû. Lê dema terez bariya cih nema

ku hûn xwe têde veşêrin. Loma kenê min hat ku gelo ji dêlva terezê gullên dijmin bana wê yê çawa bikira?

**

Kîloyên Dawo

Weşandin: 13/07/2009 , Bûbê Eser

Dawo kurê malê yê mezin bû, loma ew di nozdeh saliya xwe de hatibû zewicandinê. Dema temenê wî dibe bîst, ew dihare leşkeriyê. Leşkeriya wê demê gelekî zor bû. Eger meriv Kurd ba, ew leşkerî li mirov dibû zîndan, dibû cihê tade û îşkenceyan.

Dawo kurê malê yê mezin bû, loma ew di nozdeh saliya xwe de hatibû zewicandinê. Dema temenê wî dibe bîst, ew dihare leşkeriyê. Leşkeriya wê demê gelekî zor bû. Eger meriv Kurd ba, ew leşkerî li mirov dibû zîndan, dibû cihê tade û îşkenceyan. Lê çî dibe bila bibe, Tirkan di serê gelek kesan de bi cih kiribû ku: “Ew kesên leşkeriya xwe nekiribin, ne zilamin”, “Leşkeri deynekî welêt e, divê ew bê dayîn” Dema deynê Dawo jî hatibû, wî jî, ji bona ku bibe zilam berê xwe berbi xerîbiyê vekiribû. Ji mirov û ji şêrîna ber dilê xwe bi dûr ket.

Piştî çend mehên Dawo li leşkeriyê qediyabû ku rojek ji rojan pîreka wî dinêre ku vaye Dawo yê wê di rê de ye û berbi mal ve tê. Berê ew bawer nake ku bi rastî jî ew e. Loma hinekî çavên xwe diqurpistîne û bi pişta destê xwe yê rastê tev dide, dinêre ku bi rastî jî ew e. Ew jî berbi wî ve dihare, xêrhatinê lê dike û dibêje:

- Dawo ma te leşkeriya xwe qedend?
- Keçê qedandina çî halê çî! çar sal wê çawa biqede ez jî niza
- Lê ev hatina te ji bona çî ye? Xêr e, i
- Keçe bes e, hela em xwe bighînin hundur, dûre ez ê ji te re bêj

Pîreka wî çentê di destê zilamê xwe ê leşker de bû girt, ji hewşê berbi ketina malê de çûn û ew ketin hundur. Hetanî wan xwe gîhandin hundir, çend gundiyan jî dîtibûn ku Dawo ji leşkeriyê vegeriya ye.

Dem dema êverî bû, piştî şîvxwarinê adet bû, gundî biçûyana xêrhatina kesên ku diçûn xerîbiyê an jî jê vedigeriyan, bikarana. Ji ber ku Dawo jî ji leşkeriyê vegeriya bû, divyabû êvarî gundî biçûyina mala wî û xêrhatin lê bikirina, hal û hewalê wî bipirsiyana. Gundiyan weha zû leşkerî qedandina Dawo meraq kiribûn û wan ê ji wî bipirsiyana ku wî çawa weha bi çend mehekî leşkeriya xwe qedandibû. Loma êvarî civata Dawo geriya, kesên bihîstin, hatin mala wî. Piştî qedandina xêrhatinê û vexwarina çayê, ji rîsipyên gund xalê Xelo ji Dawo pirsî:

- Wa Dawo, qasî ku ez dizanim, leşkerî çar sal in. Lê ez bala xwe didimê ku ancax çar mehên te qediyar ku tu hate mal, xêr e gelo?

- Xalo bi xwedê kîloyên min li gor wezna leşkeriyê derneketin, loma Serbaz ez şandim mal da ku hinekî goşt bigirim ku kîloyên min, li gor wezna leşkeriyê hev bigirin. Ez ê piştî sê mehên din dîsa li leşkeriya xwe ve

- Ha, got xalê Xelo, serê xwe weke alimekî hejand û domand. Em jî tirsîyan, me got dibe...

Hîn xalê Xelo axaftina xwe neqedandibû, hema apê Kirkirkê ku ew bi xwe ixtiyarekî gundiyan bû û Zirnavê (leqeb) wî Kirkirkê bû. Ev zirnav an jî ev leqeb ji ku girtûbû qet nedihat zanîn. Ev nav an jî ev leqed bû bû navekî wan î malbatî. Navê wî Ehmo bû. Li êdî ew bi navê Kirkirkê dihate nasîn. Xalê Kirkirkê, mirovekî xweşbêj, henekçi û nefsbîçûk bû. Wî gelek caran bi henekên xwe, gotinên dilê xwe yên hişk, li noqa hinê ku wî ji wan heznedikir, dixist. Got.

- Tu çima nabê ji niha û pêde em ê xortên xwe temî bikin ku berî çûyina xwe ya leşkriyê bila xwe zeîf bikin, da ku ew jî weke te zû werin mal. Bi

gotina wî re kesên wir hemû kenyan û wan fêm kir ku xalê Kirkirkê çima weha got.

Şêx Mehemedê, kurê sêx Deman, bi nav û dengê xwe şêxekî şêxan, lê bi emelên xwe ne tu tiştêk bû, ji derî kete hundir, hemû gundî ji ber rabûn, ew çû ba Dawo destê xwe dirêj kir û got:

- Tu bi xêr hatî Dawo! Çima te weha zû leşkeriya xwe qedand lo? Gelo dema leşkeriyê kurt bû ye? Û haya me jê tune ye

Dawo destê şêxê xwe maç kir. Berê şêx û dûre jî hemû gundî runiştin. Dawo jî xwe li ser kulavê bi rengîn da erdê û got

- Na, şêxê min na! Leşkeri weke berê ye, yanî hîn jî çar sal in.

Şêx Mehemed li dora xwe nerî, serê xwe hejand

- Lê te çima weha zû qedand?

- Şêxê min, min zû neqedandiye. Ji ber ku kîloyên min kêr bûn, wan ez şandim mal da ku kîloyên xwe tamam bikim û ez ê dîsa

- Ha, ev mesele, got şêx Mehemed. Ji nûve bi awayekî rehet xwe li ser kulavê xwe ediland, milê xwe yê rastê sipart balîfa (balgî) kêlekê û dest bi şîretan kir

Piştî belavbûna gundiyan, ji nû ve Dawo rewşa hatina xwe ji pîreka xwe re jî rava kir. Bi hev şa bûn û razan.

Dema sê mehên Dawo qediyên li leşkeriya xwe vegeheriya. Roja ku wî xwe gîhand cihê xwe. Serbazê ku ew ji bona çend kîloyan bigire şandibû mal, ew wezinand, dît ku kîloyên wî weke yê berê ne. Nebû ku wî dîsa bişîne malê. Piştî vegeherê çend mehên Dawo li leşkeriyê tamam bûn. Serbaz rojekê banî wî kir û ew dîsa wezinand. Nerî ku kîloyên wî hê jî weke yê berê ne, ne kêr û ne zêde kiriye. Serbaz ji vê rewşê şaş mabû û biryar girt ku dîsa Dawo bişîne mal da ku ew hinek goşt bigire.

Piştî çend mehekî din ku Dawo qet kîloyan nagire, loma Serbaz wî dîsa dişîne mal. Ew çar mehên din li mal ma û vegeheriya leşkeriya xwe. Vê carê

kêfa Serbaz li cih bû, wî texmîn dikir ku vê carê Dawo hin kîlo girtine. Banî wî kir û bir cihê weznê. Çi mixabin ku Dawo ne kêr û ne jî zêde kiribû. Kîloyên wî weke yên berê bû. Loma serbaz îcar hinekî aciz bû, kire niçe niçe û jê re

- Hey, xwedê nenas, ez te dişînim mal ku tu hin kîlo bigire û vegere. Lê ev du carin tu dihare, rehetiya xwe digire, xwarina xwe dixwe. Li wir ne kes li ser te û ne jî li ber te hene, lê çima tu kîlo nagire.

Vê carê Dawo hinekî tirsîya bû ku serbaz li wî bide, loma wî bi awayekî tirsonek

- Ma çi dizanim, qomandarê min

Serbaz ji halê wî şaş û matel mabû, wî jî nema dizani bû ku çi bike. Li leşkeriyê pêwîst bû ku kîloyên mirov li gor pîvana hatibû dayîn ba. Ji bona kîlogirtinê serbaz du caran Dawo şandibû mal, ev jî mesrefek bi serê xwe bû. Da û stand, çend rojekî fikirî û dîsa şande pê wî. Dawo hate silavek baş ya leşkerî da û got.

- Emir bike qomandarê min, we şandibû pe

- Belê, belê. Ka were em bi hev re herin aşpêjxanê ku temiya te bidim wan ku ew te hinekî qelew bikin, da ku tu leşkeriya xwe biqedîne. Bi vî halî tê bibe belaya serê me

Qomûtan li pêş û li dû wî jî Dawo ketin hundir aşpêjxaneyê leşkeriyê. Kesên li hundir ji ber wan rabûn. Serbaz gazî kir û got:

- Kî berpirsiyarê vir e bila were. Bi bazdan yek ji nav koma kesên ku xwarin çêdikin berbi wî hat, qomûta xwe da û got:

- Emir bike, qomandarê min

- Binêre! vî mirovê bi min re, baş nas bike! Ez ê wî du mehan teslîmî te bikim. Tê rojê sê caran, çi xwarina xweş ku wî xwest, jê re çêke

- Tu emir bike, qomandarê ê m

Serbaz îcar li Dawo nerî, kenîya weke bêje “Ka bê îcar tu kîloyan digire an na” û bi dengekî berz got:

- Binêre Dawo! tê du mehan li vir bixwe, vexwe û dilê te çû çî tê ji wan re bêje. Tu çî bixwaze wê ji bona te bê çêkirin. Ji niha û pêde tu yê nobedariyê jî negire. Piştî çend mehekî em ê li halê te binêrin, bê kîlo girtin çawa dibe.

Niha kêf bû bû kêfa Dawo. Li vê leşkeriya zor, ji bona wî ne nobedarî û ne jî lêdan hebû. Berovajî wê, Serbaz ew danî bû ba aşpêj û dilê wî çî bixwesta wan jê re çidikirin. Du mehên Dawo bi vê kêf û rehetiyê qediyabûn. Rojekê dîsa Serbaz dişîne pê wî. Ew hat, serbaz li halî wî pirsî û

- Îcar tu çawa yî Dawo, te kîlo girt an na? Em ê niha fêhm bikin. Bide dû min, em ê herin te biwezinîn in. Serbaz bi kêf da pêşiya wî û çûne ba mêzînê. Wî gazi kir

- De, here ser mêzînê em binerin bê îcar tu çend kîlo ye.

Dawo qet tişteke negot, sola xwe derxist, kincên xwe ji xwe kir tenê derpî li ser xwe hişt û hêdî lingên xwe danîn ser mêzînê. Lê çî mixabin ku mîla mêzînê, kîloyên wî weke yên berê nîşan da. Dema Serbaz çav li kîloyên wî ket hêrs bû. Bi qêrîn ji wî re got

- Peya be! û bi dengekî berztir axaftina xwe domand.

- Diya te heye?

- Na! Qomandar

- Bavê te

- Na qomandarê min!

- Ma tu çima neabêje ku ew ji derdê te mirin in.

Ev nivîs di Çîrok de ye.

Dergûş

Weşandin: 18/07/2009 , Zinar Soran

Rojek ji rojan, lawekî Sîno çêdibe. Pîreka wî jê re dibê:

- Sîno, divê tu herî cem xerêt, dergûşekê ji bo lawikê me bidî çêkirin.

Sîno berê xwe dide dikana xerêt. Jixwe, hew xeratak tenê li wê derê hebû. Destê wî hinekî giran û bîhna wî jî gelekî teng bû. Gava Sîno dighêje cem xerêt, silavê lê dike û wê daxwaza xwe jê re dibêje. Berî ku ji dikanê derkeve, perê dergûşê dide xerêt û hinekî jî lava dike, ku dergûşê zû çêbike.

Lê mixabin teva ku Sîno ji çend rojan carekê diçû cem xerêt û jê dipirsî jî, her gav ew dest vala bi ser malê de vedigeriya. Xerat carna bîhna xwe teng fikir û digot:

- Heyran, dibê tu weha li min ecele nekî. Tu dizanî gelek kar li ser min heye û ez jî dixwazim ku rojek berî rojekê dergûşa te biqedînim.

Ew lawikê ku wê dergûş jê re çêbiba mezin dibe, tê kemala zewacê, dizewice û piştî salekê zarokê jê re çêdibe. Şahî û kêfxweşiyek mezin dikeve nava mala Sîno. Ji bo torinekî Sîno çêbûye, ew gelekî bi kêf dilşad e. Dîsa dergûşek pêwîst e. Pîreka Sîno daxwaza dergûşekê dike. Lê vê carê ji bo nebiyê xwe. Sîno ji lawê xwe re dibêje:

- Kurê min, gava tu hatibû dinyê, min dergûşek ji bo te danîbû ser xerêt û pereyên wî jî pêşin dabûye. Tu bi lez here cem xerêt, silavên min jî lê bike. Maşalê wî ew dergûş çêkiribe.

Lawê Sîno bi kêf dihere dikana xerêt, silavê li wî dike û dibêje:

- Apo, gelek silavên bavê min li te hene. Gava ez hatibûm dinyê, wî ji bo min dergûşek danîbû ser te. Niha xulamê te be, lawekî min çêbû. Ez hêvîda im ku te ew dergûş çêkiriye.

Xerêt got:

- Xortê delal, weleh hîn min ew dergûş çênekiriye.

- Apê delal, ez heyrana çavê te me, tê destê xwe hinekî sivik bigrî û wê dergûşê zû çêbikî. Tu dizanî zarok bê dergûş nabe...

Gava xort weha got, bîhna xerat teng bû û bi hêrs ji xort re got:

- Heyran, eger tê jî weke bavê xwe li min ecele bikî, fermo perê bavê te û ez tu dergûşa çênakim.

Çima we neda dest?

Weşandin: 07/11/2011 , Xorşîd Mîrzengî

Bazo di eywana qerqaş de, pala xwe dabû palgeha qedîfe, ling avêtibûn ser hev, fincana qehweya tehl di dest de, bi dengê çirika hewza hewşê re, bi tiliyên destê çepê porê xwe ser kêlekê şeh dikir, bi bişirînê ji xortên rûniştî re digot:

“Me çi gedûg dîtî, çi gedûg. Sala 1968an, ez û Qedo, em li Stenbolê, rojekê berêvarê em çûn meydana pêş qereqola Bakirköyê. Em li dolmîşa Şawerlû siwar bûn. Em ê herin Teksîmê, ji wir jî herin Mecidiyeköyê cem filekî me yê licî. Em li palgehên paş siwar bûn. Dema em siwar bûn, tarî ketibû erdê, lembeyên kolanan pêketibûn. Şofêr li derve bang dikir: ‘Teksîm, Teksîm, Teksîm.’ Palgehên texsiya Şawerlû yekpare û li pêşiyê, tevî şofêr ciyê sê merivan hebû. Piştî qasekê, mêrikekî qelew, jinikeke bejinzirav û porzer hatin, li pêşiyê siwar bûn. Çaqirkêf bûn. Jinikê ji şofêr pirsî:

“Çend mişterî kê in?”

“Yek, efendim.”

“Bajo, heqê wî jî em didin.”

Şofêr kilît bada û bi rê ket. Di destpêka rê de, jinika tenik ciyê xwe bi kes kir, milê çepê avêt ser palgehê pişt mêrikê pêre, milê rastê li ser mildanika derî danî, berê xwe da mêrik û fena ew her du tenê di texsiyê de bin, got:

“Erê min çi digot, erê erê kalikê min efser bû. Li Bedlîsê qumandarî kiribû. Gava ez piçûk bûm, ew teqawid bûbû, êvaran ji min re xeberoşk digotin.

Digot, li Bedlîsê kurd hene. Ji her simbêleke wan werîsek çêdibe. Lê digot, bi dûv in.”

Dema got ”bi dûv in”, em ji Dîkilîtaşê bihurîbûn û gihîştibûn rêya Londra Asfaltî, serejêra Merterê. Ez û Qedo, em veciniqîn, me li hev nêrî... Jinikê veciniqîna me ferq nekir. Sar nekir û domand:

”Mêrên wan, fena mêrên me serqot nagerin, yan papax, yan jî kolos didin serî. Navrana şelwarên wan dirêj û şapikên wan fire ne. Jinên wan jî kofî didin serê xwe. Bi pêşiya kofiyên, ser eniyê ve qorên zêran hene. Kitanên wan jî dirêj û gulgulî ne. Yê kol melhefê diavêjin serê xwe, qîz jî laçikên gulgulînê û dormorîkirî. Qîzên destgirtî jî kofiya bê melhef didin serê xwe. Bi lêfan morî û mircanan dixin stuyê xwe. Nizanin rûj û oje çi ye. Mêr dûvên xwe di nava şerwalên navrandirêj, şapikên fire, jin jî di binê kitanên dirêj de dûvê xwe veşêrin.”

Dema got: ”dûvê xwe veşêrin” em di Topkapî de ketibûn hundir û gihîştibûn semta Kocemistefa Paşa. Ji xwe çavekî Qedo piçekî xwar bû, gava wê digot: ”Bi dûv in.” Ew çavê Qedo yê xwar ji ciyê xwe derdiket, hewl dibû. Hindik dima çav ji şûna xwe baz bide der. Jinikê dewam kir:

”Kalikê min digot, gava li hev dixin, bi dehan mêran ji hev dikujin. Kesek nikare bi jina kesekî re biaxife. Heke biaxife kuştin çêdibe. Di dawet û şahiyên de, cilên pirreng li xwe dikin. Govend û lîstikên wan xweş in.

Merd, camêr, ga û golik di çavên wan de yek, di mala xwe de çavfire. Tu herî mala wan, tenê kerîkî nanê wan hebe, xwe birçî dihêlin, pariyê nanê xwe jî didin te. Payeyeke bilind didin mêvanan. Yê ku tenê karikekî wî hebe, wî karikî jî ji mêvanê xwe re serjêdike. Serê pijandî li ser sênîyê, lengeriya birinc datîne.

Gelek ciyê jinan dizanin, gava mêrên wan jî bîn kuştin, cendekên wan jî li erdê bin, jinek xwe bide pêş û melhefê veke: ‘Ji bo xatirê min hurmê,’ wê gavikê hev nakujin. Li ba wan namûs, tenê jin e....”

Heya vir ne mêrikê bi jinikê re û ne jî şofêr deng nekiribûn. Li vir, mêrik got:

“Min bihîstibû dûtê kurdan heye, lê min ewqas berfire nedizanî.”

Şofêr jî bi keneke daketî got:

“Min ji jî gelek bihîstiye ku dibêjin kurd bi dût in. Lê kalikê xanimê baş jê re qal kiriye. Hellal be, ji wê piçûkiyê jî ji bîr nekiriye.”

Em ji Findiqzadeyê derbas bûn, di xaçerêya Aksarayê de zivirîn, wê her behsa macarayên kalikê xwe û kurdan dikir. Lê dawiya her bêhneke xwe de “dût” ji bîr nedikir. Ez bi ser Qedo de zivirîm, min got: “Ez ê bi mêjiyê vê xemşê ve deynim. Dêlika çiptazî.” Qedo bişirî, got: “Na na, tu ji min re bêle.”

Jinik bi mêrik re nermik diaxifî. Porê wê yê zerik û filfilî, hinekî jê bi palgehê de hatibû xwarê, bîneke xweş jê dihat. Ji wan gotinên wê yên req û çors nebûya, mêranî danî bîra meriv, lê wan gotinên wê yên tehl, ew bîna xweş jî li me kir qarnaqusî, ziqnabût. Texsî ket binê pira Sarîncxaneyê. Binê pirê hinekî loş bû. Hemî hemî fena tu çavê xwe bigrî û vekî, dîtina min dît, Qedo destê jinikê girt û “dûtê xwe” xist nava lepê wê. Wê jî bi şaşî got çika çî ye, qevd kir. Çapa destê jinikê tijî bû. Ji nû de ferq kir.

Qedo got: “Budur qoyriximiz.” (Ev e dûtê me)

Gava jinika stenbolî “dût” di nava qevda destê xwe de, bi çavên xwe dît, veceniqî, ne tenê veceniqî perç bû, hej lê ket, qapaxa serê wê firî, fena dê mar bi destê wê ve deyne, destê xwe zû bi paş de kişand, ji ciyê xwe bilind bû, serê wê li qûna qatîyê erebeyê ket. Pê re qîrîniya, bi wê qîrînê re şemaqeke stenbolî weşand Qedo, yeke din jî yeke din jî. Qedo nedixwest lêxe, lê nêrî zerê sar nake. Wele Qedo destê wê girt, çend şemaqên kurmancî tê de helandin, ‘qaltax,’ got, ‘te boçik neeciband? Tu li dûveka çawa digerî?’

Şofêrê reben wezna ajotinê winda kir, erebe rast û çep li binê guhê rê diket. Heya min û mêrik ew ji hev kirin, Qedo ew sor kir. Porê wê bû gij, lêvên wê ziwa, boyaxa ruyê wê hetikî, kilê çavan bela bû, çavên wê ji hêrsan fena qûna meymûnê sor bûn.

Kurd dibêjin: 'Yê zane, zane, yê nizane dibêje qey baqê nîskan e.' Mêrikê bi jinikê re û şofêr nizanibûn çî bû. Mêrik ji jinikê pirsî:

"Çi kir?"

Jinik nikaribû bibêje. Zîq li nava çavên mêrik mêze kir, destê xwe vekir û lê nêrî. Çend caran li ser hev wisa li kefa destê xwe nêrî. Radiwestî, radiwestî dîs li kefa destê xwe dinêrî.

Eşkera bûbû semedê şer, dûv e. Min bi hêrs got: "Xanim efendî, ji Bakırköyê heya vir, te sed carî tekrar kir: "Kurd bi dûv in." Dûv mûv bi me ve tune. Kalikê te direw kiriye. Heke bawer nakî, ez ê şerwalên xwe deynim ji paş û pêş binihêre. Çi bi we ve heye, ew bi me ve heye. Dixwazî xwe tazî bikim! Çima hûn tometan dikin, xwe dixapînin?" Li ser gotinên min, her sê jî bêdeng man, serê xwe kirin ber xwe.

Piştî sinûxbûna jinikê û amoşbûna Qedo, şofêr bi rê ket. Em ji Pira Menderes gihîştin berwara Azapkapî, me da Qiyameya Şîşxaneyê. Te digot qey kes di texsiyê de tune. Bêdengiyê ke kûr di hundirê texsiyê de, heya em ji çeqa Serê Tunelê zivirîn ketin ser kolana Îstîqlalê çarşiya Begoxlî jî wisa, deng tune bû. Sirrekî di wê bêdengiyê de hebû. Temamê lembeyê reklamên rengîn yên bar û meyxaneyan pêketî bûn. Çarşiya Begoxlî qelebalix, fena kurmorîyan, hin diçûn hin dihatin. Li nava çarşiyê, pêşiya Galata Saray Lîsesî du polîsên dewriyeyê, ji hêla Texsîmê, li ser milê rastê dihatin. Şofêrê texsiyê li ber polîsên dewriyeyê tapêl kir û rawestiya. Jinikê bangî polîsan kir. Bilî ji texsiyê peya bibe, jinikê em bi dest nîşan kirin ji polîsan re got:

"Vana vana, kurd in... Heqaret li min kirin. Çîrê min dan. Ez dawaçî me..."

Mêrikê bi wê re jî got:

“Em xwediyê Tiyatroya Halk ya Bakirköyê ne. Îşev lîstika me li Şanoya Teksîmê heye. Gere em bigihîjin lîstika xwe. Em nikarin niha bi we re werin qereqolê. Van bibin! Em ê sibê werin îfadeyan.”

Şofêrê texsiyê jî got:

“Belê, rast dibêjin. Ez jî şahid im. Li xanim efendiyê dan û sixêfên wê kirin.”

Ev di hesab de tune bû. Hişê me çû ser demançeyên me. Min bi kurdî ji Qedo re got: ‘Heke polîs bixwazin me yoxleme bikin, em li wan biteqînîn û birevin.’ Qedo jî serê xwe bi vateya erê hejand.

Polîsekî got:

“Dakevin xwarê!”

Em daketin. Teksî çû.

Polîsê dirêj û bi simbêl, bi aksana şerqê, lê nermî ji min pirsî:

“Hûn ji ku ne?”

“Em diyarbekirî ne.”

“Hûn hatine Stenbolê çi?”

“Em dixwînin.”

“Çima hûn pevçûn?”

“Jinikê çavsorî li me kir.”

“We sixêfên jinikê dane, ne eyb e?”

“Direw kir, me sixêf nekirin.”

“Çima bû gilîkar?”

“Gotinên nexweş ji kurdan re gotin.”

“Çi got?”

“Got, kurd bi dûv in.”

“Çiii, got çii?”

“Got, kurd bi dûv in.”

“We çî got?”

“Me got, vir e.”

Her du polîs jî kenyan, em jî bi xwe re dan kenandin. Piştî wê kena me, polîsê dirêj dîsa bi ken got:

“Çima we neda destê qaltaxê?”

Min dengê xwe nekir, ez di ber xwe de keniyam.

Qedo bi ken û serbilindî, destê rast kir berîka xwe û got:

“Herê abê, min da destê wê.”

Xwepêşandan

Weşandin: 04/12/2011 , Paşa Brodrêj

Ûso, Hesên û Ahmed diçin xwepêşandanê. Ûsoyê Çavbenîşt, Barût Hesên û Ahmedê Pozqut mîna her carî li qexwexaneyê Heciyê Kor rûniştibûn.

Çaya xwe vexwarin şûnda Ûso got:

-Rabin em herin meydana Qaniqûyê.

-Em ê li wir çî bikin?

-Dibêjin, cardin li wê derê toplantî heye?

Qadirê Pozqut got.

-Toplantiya çî ye?

Ûso awirê xwe piçek tehl kir.

-Ma ez çî zanim toplantiya çî ye! Rabin em herin temaşe bikin, ka hele çî dibêjin.

Barût Hesên got.

-Dibe, çima nebe! Li vê Qeleboxaziyê û li vê qehwexaneyê Hecî, êdî em tetirxanî bûn.

Li ser milê wan çakêtên qaçax, li ser wan şewqeyên sîpertûj, di lingê wan da qondireyên poçikşikandî, ketin rê. Simbêlên Ahmedê Pozqut mîna qoçê berana bû, bi her aliyekî wan ve meriv dikanîbû kidikek mast

daliqanda. Gava gîhaştin meydana Qaniqûyê û çavên wan li leşker û polîsan ketin, madê Ahmedê Pozqut xira bû.

-Law weleh tişteq biqewime em ê li ber linga biçin! Got.

Barût Hesên got.

-Çêtir e em derkevin serê xaniyan. Em ê ji xwe ra rûnin û temaşe bikin.

Ûso got.

-Temam! Ji ser xaniyan merî kane her kesî bibîne, çêtir e.

Li bakurê meydana Qaniqûyê, Ûsoyê Çavbenîşt, Barût Hesên û Ahmedê Pozqut beriya gişka derketin diyarê xaniyekî û çarmêrkî rûniştin. Bîstek şûnda Qoçoyê Dîn jî hat û li nêzî wan rûnişt. Dînekî bêzerar bû. Eger kes têkilî wî nebûya, ew têkilî kesî nedibû. Lê gava ji yekî, ji tişteqî hêrs bibûya, dinya danî xwarê.

Pirr neket navberê, serê xaniyên çardoraliya meydanê, bi nişteciyan têje bû.

Li navenda meydanê, Radyo Telat li ser kamyoneke Thames, kabloyên hoperloran bi mîkrofona li ser kursîya peyivdaran ve girê didan.

Serê Kelaya Swêregê, herdu aliyên kolana ku seriyekî wê li ser riya Rihayê, seriyê din jî digîhaşt meydana Qaniqûyê, bi komando, leşker û polîsan ve hatibû dagirtin. Lê meydan hîn vala bû.

Ajoyê Şaredariyê Swêregê Tankêr Şefîq, bi tankêra xwe li ser bîra Qaniqûyê rawestiyabû. Serê xortimê xist nav tanqa avê û bişkova motorê zivirand. Xurînî bi motorê ket.

Bêtêl di destê qomsêrê qereqolê da, polêsên fermî û du polêsên sifîl (sîyasî) li pey, bi lez gihîştin cem Tankêr Şefîq.

-Sen nerden çiktin lan! Çabuk meydanê terket! (Tu ji ku derketî kero! Zû ji meydanê biterikîne!)

Şefîq bi berxwedanê got.

-Ev du roj in, taxên doralîya Swêregê bê av in. Gerek ez avê ji wan ra bibim.

Qomsêr bi awirek tûj, bi dengê bilind, bi ser Şefîq da zirtiya:

-Sû mû zamani deşil kardeşim, çekil git! (Wexta avê mavê nîne birrê min! Biteqize!)

Yên li serê xaniyan, li wan mêze dikir. Qomsêr dît Şefîq xwe naleqîne, dest avêt piyê wî û xwest wî bidafîne paş dîreksiyonê.

Usoyê Çavbenîşt xwe pê negirt, rabû ser piyan û qiriya.

-Ûla siz ne yapîsiz! Birax herif su götürsün qardaşim! Siwerek olmiş Kerbela, Kerbela! (Kero hûn çî dikin! Berde bira mêrêk avê bibe! Swêreg bûye Kerbela, Kerbela!)

Barût Hesên dest avêt guça çakêtê Uso.

-Law Uso, di ciyê xwe da rûne!

Ahmedê Pozqut got.

Law Uso ji boyê Xwedê dengê xwe dermexe!

Lêbelê tîr ji kevan pekiya bû, bi qîrîna Uso, yên li serê xaniyan hatin xezebê.

-Şofirê biraxinn ûlannn! (Ajoyê me berdîn, kerno!)

-Gücünüz bize mê yetî ûlan îbnelerrr! (Qeweta we ji me re heye, qûndeno!)

-Mîlet sû yoxlixindan qirilî qardaşimmm!(Xelk ji bê aviyê dibehêce birrê min!)

Hinekê bi ser polêsan da qiriyan, hinekan xîç û kevirên ser xaniyan weşandin wan. Yên ku xîç û kevir bi destê xwe nexistin, hema bi lepan axa ser sivîngan lep kirin û avêtin polêsan.

Lawê Ahmedê Duşêşî Mizo û du hevalên wî hilkêşiyabûn ser dîwarê sînemaya havîngeh. Ji aliyekê zebeşa xwe dixwarin, ji aliyekê jî temaşeyî tevliheviya qirdika serê meydanê dikirin.

Wan jî qalikên zebeşan avêtin polêsan. Qalikekî di ber guhê Qomsêr re derbas bû. Çû li tankêrê ket, hindik mabû li serçavê Qomsêr biketa.

Qoçoyê Dîn jî hêrs bû. Virda wirda çavê xwe gerand lê tişteke nedî. Ahmedê Pozqut got:

-Le law tu çî digerî, hema loxa ku tu li ser rûniştêye loxî jêr bike!

Qoçoyê Dîn yek nekir didu, hema di cîh da bi linga xwe lox daf da. Ew loxa qerrase jê ser xênî fitilî, bi gurmînî li jêr ket. Ji gurmîna loxê şûşe û qedehên ser maseyan, camên şibakan lertzîn. Xêra xwedê wê gavê kes li meydanê tune bû. Eger ew loxa gambora bi ser yekî da biketa, dê bi henciqanda.

Leşkerên li dora meydanê û yên li ser Kelayê, gule ajotin devê tifangan, pêçî dan ser tetikan û berê wan dan qelebalixa ser xaniyan, polêsan li tûtikan dan û dest avêtin demançeyên xwe. Dikandarên dora meydanê perepaşkî vekêşiyên dikanan. Êsoyê Çavbenîşt, Barût Hesên, Ahmedê Pozqut çend gav xwe paşve vekêşandin. Zarokên derdora meydanê her yek bi aliyekî ve pekiyan.

Di nav wê teşxelê da, polêsan Tankêr Şefîq ji bîra kirin. Şefîq tankêr tije av kir. Motora avê da rawestandî û derbasî paş dîreksiyonê bû. Qamyon xebitand û bi rê ket. Bi çûyîna tankîrê dawî li şemate hat.

Polês û leşker paşve vekêşiyên. Yên serê xaniyan cardin li ser kamaxa xwe rûniştin û temaşa meydanê kirin. Zarokên bîstekê berê ji ber çava wînda bûbûn, veşeriyên ciyê xwe. Dikandar hêdî hêdî derketin pêş dikanan.

Qomsêrê ku bûbû sedema vê xirecirê, ji ber bîra Qaniqûyê, bi pêçiya xwe ciyê Êsoyê Çavbenîşt lê rûniştibû, nîşanê wan her du polêsên sifîl (sîyasî) da.

Di destpêkê da xwepêşandêr li ber Goristana Şaredariya Swêregê qor bi qor civiyabûn, di rêzê da, gihaştibûn navenda bajêr.

Karmendên Şaredariya Swêregê, Sümerbanqê û mêvanên otêla Pamûk Palasê derketibûn nava şibakan. Karker, esnaf, dikandar û nişteciyên Swêregê derketibûn ser kolanê û di ser leşker û polêsan ra li wê karwana rengîn û dengîn dinêrîn.

Li pêşiya her qefleyê bandrolekî, di destê wan da pankart, dirûvên şehîdan hebûn. Qeytanekî sor bi piyê wan ve girêdayî, berpirsiyarên ewlekariya xwepêşandêran li çep û rastê karwan difitilîn. Ferman didan megafonhilgiran, slogan davêtin. Dengê wan gurr bû, bajar dihejand.

Di her qefleyekê, her rêzkê da keç û law bi hev re dimeşyan, bi hev ra sloganan davêtin, yekdeng bûn.

Gava gîhaştin pêş Şaredariya Swêregê, lawikekî çeleng ku megafon di destê wî da, mîna pilingekî hilkêşiya ser dîreka elektrîkê. Qasekê çavên xwe li ser qirdika xwepêşandêran gerand û devê xwe bir ber megafonê: Kurda raaa Azadî, Kurda raaa Azadî, Kurda raa Azadî!

Awaza xwepêşandêran fena babilîskekê li dora xwe fitilî hilkêşiya binê ezman.

Li meydana pêş Şaredariyê, Xaşxaş Ahmed titûna qaçax difrot. Ew jî mîna her kesî li ser piya rawestiyabû û li karwan temaşe dikir. Bi carekê destê xwe yê çepê da paş kamaxa xwe û di destê wî yê rastê da jî destmala sipî, li dora tepsiya ku titûn li ser raxistîbû, bi reqis fitilî:

-Ez heyran û ez qurban! Kemal Paşa çok Yaşa! Kemal Paşa çok Yaşa!

Xwepêşandêrekî xwe gîhand Xaşxaş Ahmed û ji ra got:

-Xal Ahmed, tu ma rezîl û riswa kenê! Ma qarşiyê Mistefa Kemaliyê.

Xaşxaş Ahmed, xwêdana serçavê xwe bi destmalê pak kir û got:

-Êê la şima çirê nivanê! Ma ez kotîra zana!

-Noyo ma torê vanê! Ma vanê ma kurdî yê o ma wazenê Kurdistan azad bibo. Coka ma vanê Kurda ra azadî.

-Aaa nika min fam kerd! Heta şima tiyara ravêrê, edo jî vaca Kurda ra azadî û kay kera.

Heta temamê karwanê ji ber Xaşxaş Ahmed derbas bû û dawî hat, wî lîstika xwe sar nekir. Xwêdan fena avê pê da dihat xwarê.

Mistefayê Kêzêka, Ahmed Çawişê Qoreyî û Zilfoyê Rêxo li ber otêla Pamûk Palasê rawestiyabûn. Ahmed Çawiş got.

-Law hele tu li vê ecebê mêze bike! Vana mîna leşkerên Qoreyê ne bavê min. Hele mêze, hele mêze... ne yek e, ne dudu ye... Ev çi tedbîr û ev çi dûzane! Evqas merî ji ku hatin, evqas beyraq û evqas resim ji ku peyda kirin!

Mistefayê Kêzêka got:

-Law ez qurbana bejn û bala wan bibim. Gişk ciwan û delal in. Merî qimîş nabe lê wan mize bike.

Zilfoyê Rêxo bêhna xwe teng kir:

-La şima qet qisey xwe nizanê! La nîna hemê qominîstê qominîst!

Mistefayê Kêzêka hêrs bû, gopala xwe rakir hewayê û hêjand.

-Bileheq ji te ra negotine Zilfoyê Rêxooo! Tu ji ku zanî ew qominîst in law? Li ser eniya wan dinivisîne!

-La tu çi qehiryênê Misto! Şar wênî vano, ez sekera!

Temamê esnaf û mişteriyên kuçeya Qesaban derketibûn serê kuçeyê û li çepikan lêdixistin. Îboyê Deqo, wê gavê, li Qeleboxaziyê, li ber qehwexaneyê Heciyê Kor rûniştibû. Gava dît ku neferên kuçeya Qesaban ber bi serê kuçeyê herikîn, wî jî xwe gîhand wan. Qederek şûnda Heciyê Kor jî hat li rex wî. Qasî bîskekê li karwana xwepêşandêran û çepikvanan mêze kirin. Hecî got:

-Ev swêregiyên mena jî tam sînemaskop in. Ji her kesî ra li çepikan didin.

Îboyê Deqo got:

Meydana Qaniqûyê di demekê kin da bi xwepêşandêran ve heta ber dêv tije bû û herikî nava kuçeyên çarmedora meydanê. Panqart, afîş û bandrolên ku li ser wan hezar babet slogan, navên kom û komeleyan nivîsandî, mîna dismalên li ser darê zîyaretan, Meydana Qaniqûyê bi rengên kesk, sor û zer xemiland û dirûvê behrekê rengîn dan meydanê. Axivker yeko yeko derketin ser kamyonê, devê xwe birin ber mîkrofonê. Pîrr qise kirin, dirêj qise kirin, bi tirkî qise kirin.

Bilî wan çend sloganên mîna, “Kurdara Azadî”, “Bimre Koletî”, “Bijî Azadî”, “Bimre Axatî”, Êsoyê Çavbenîşt, Barût Hesên û Ahmedê Pozqut sloganên din fam nekirin.

Bêhna Ahmedê Pozqut teng bû.

-Rabin em herin! Ji qîsê van em tiştêk fam nakin, got.

Êsoyê Çavbenîşt got:

-Ma gava tirkî qise bikin, em ê çito fam bikin!

Barût Hesên got.

-Vana çima wa dikin law? Ma vana ne kurtçî bûn?

-Kurdçî ne, feqet nizanin kurdî qise bikin.

-Çima? Ma mêjîyê kera xwarin e?

Uso got:

-Law Heso ez ji ku zanim! Ma min navika wan biriye!

Her sê bi hev ra rabûn, piştê xwe dan meydanê, saqo û şelwerên xwe rast kirin ku biçin, sewtek nas ji hoperloran bilind bû.

-Em ji wan natirsin...

Behra rengîn mîna hêlkanê hejiya, çû û hat, Êsûyo Çavbenîşt, Barût Hesên û Ahmedê Pozqut li ciyê xwe girizîn û man.

-Law ev kurdî qise dike!

-Erê wele! Ez heyrana çavî wî bim!

-Erêêê erêêêê! Gerek wiha be haaa! Ma em ji zimanê şimbil-dimbila çi fam dikin!

Vegeriyên ciyê xwe û guh bel kirin.

Xortê li ser kursiyê, destê xwe yê rastê rakir hewayê, komandoyên li ser Kelê, leşker û polêsên derdora meydanê nîşan dan û weke ji wan re bibêje, got:

-Em ji we û dewleta we natirsin! Em heqdar, hûn neheqdar in. Em kole, hûn desthildar in. Lê êdî bes e!

Behra rengîn çeçe çeç li hev ket û lerizî. Borîniyek wisa ji wan rabû, erd û ezman qelişîn. Kerb û xezeba heft qat di binê erdê da veşartî, ji qelîşan pijiqî der, xwe gîhand kûrahiya dilê xwepêşandêran û temaşevanên li ser xaniyan.

Bimreee Koletî! Bijî Azadî!

Kurda raaa Azadî! Kurda raaa Azadî!

Slogana dawî avêtin şûnda xortê li ser kursiyê, axiftina xwe domand.

-Welatê me

Qisa lêwêk di devê wî da ma. Jineke bi çarşevşîn, ji coş û kelecana wê gavê, xwe şaş kir û qîriya.

-Kurda raa azadî...

Lê tenê ma. Deng ji kesî derneket. Êsoyê Çavbenîşt di ciyê xwe da ferqizî, çavên wî li ser ciyê ku dengê sloganê jê derhatibû, zoq bûn. Mîna ku dupişk pêve de, qîriya.

- Ez bi heft talaqan sond dixwim ev jina min e!

Barût Hesên got:

-Jina te lu ku, ev îşana li ku!

-Ahmedê Pozqut got:

-Şefiya reben û ev îşana!

Êso hêrs bû.

-Ma ez dengê jina xwe nas nakim law! Ma vaye ez bi çavê xwe dibînim. Ew heftê û heft çarşevan jî li xwe bipêçe, ez bejn û bala wê nas dikim. Hele mêze bike hele mêze bike... çawa xwe vedişêre. Kerêêêê! Tu bise ez nuha dakevim jêr, kurdara azadî çito dibe ez ê nîşanî te bidim...

Ûso ji ser xênî daket, Barût Hesên û Ahmedê Pozqut jî dan pey. Bi hev ra gihîştin cem Şefê. Gava Ûso dest avêt çeplê Şefê, herdu polêsên sîyasî Elî û Cengîz yên ku bîstek berê komîserê qereqolê Ûso nîşanî wan dabû, bi çeplê Ûso girtin.

-Gel bakalim! Biraz once evin üzerinde ne diye horozlanıp duruyordun haa! (Ka hela were! Qaseki berê te xwe li ser xênî çi tûj fikir hiii!)

Xortê ku li ser kursiyê (ku bi xwe jî ji Swêregê bû û herdu polêsên sîyasî xweş nas fikir), ji ser kursiyê dît, Elî û Cengîz dixwazin yekî pê bigirin, devê xwe bir ber mîkrofonê:

-Hevalên berpirsiyar! Li qoziya mizgefta Gulabî, polês dixwazin hevalê me bigirin. Rê medin wan!

Du-sê hezar xwepêşandêrên li wî goşeyî, bi hev ra zivirîn ser polêsan. Elî û Cengîz, çeplê Ûso berdan û ji ber çavan wenda bûn. Xwepêşandêran ji bedena xwe li dora Ûso çemberek çêkirin, ji meydanê derxistin. Çend xwepêşandêrên swêregî yên ku Ûso nas dikirin, gotin:

-Xalê Ûso tu çavê me yî! Her bijî! Bi bejdarbûyina te em pirr kêfxweş û serbilind bûn. Me tu ji meydanê derxist ku polês te pê negirin. Heta çend rojan xwe nîşanê wan sebavan nede.

Ûso mat û lal bû, nizanîbû çi bigota û çi bersîv bidaya. Destê hev hêjandin. Xwepêşandêr vegeriyan meydanê, Ûso berê xwe da Qeleboxaziyê û Şefê ma li meydana Qaniqûyê.

2011.12.30

Ûso û sîxurê taxa Xeyriyê

Weşandin: 03/03/2012 , Paşa Brodrêj

Artêşa dewleta Tirkîyê, di 12 Adarê 1971ê da dest danîbû ser desthilatîyê, nasname û navnîşanên kominîst û “anarşîstan” li televîzyon û radyoyan weşandibûn û derketibûn nêçîra wan. Wêneyên “anarşîstan” bi dîwarên kuçe û kolanên Kurdistanê ve hatibûn daliqandin. Temamê “kominîst” û “anarşîstên” Swêregê 26 kes bûn û giş jî hatibûn girtin. Herî dawiyê sê kes (hinekan digotin du kes in, yek mêr û yek jin) ji wan, her sê jî bîyanî bûn, li taxa Xeyriyê ji xwe ra odeyekî kirê kiribûn û li wê derê xwe vedişartin, li ser saloxên muxtar Zulkîfê Xirabokî hatibûn girtin.

Artêşa dewleta Tirkîyê, di 12 Adarê 1971ê da dest danîbû ser desthilatîyê, nasname û navnîşanên kominîst û “anarşîstan” li televîzyon û radyoyan weşandibûn û derketibûn nêçîra wan. Wêneyên “anarşîstan” bi dîwarên kuçe û kolanên Kurdistanê ve hatibûn daliqandin.

Temamê “kominîst” û “anarşîstên” Swêregê 26 kes bûn û giş jî hatibûn girtin. Herî dawiyê sê kes (hinekan digotin du kes in, yek mêr û yek jin) ji wan, her sê jî bîyanî bûn, li taxa Xeyriyê ji xwe ra odeyekî kirê kiribûn û li wê derê xwe vedişartin, li ser saloxên muxtar Zulkîfê Xirabokî hatibûn girtin.

Di nav parqê da, Keriz Cimo û şîrîgê wî Evdoyê Garisî piştî xwe dabûn kêşa êzêngan û rûniştibûn. Şûşeya araqê di binê masê da, du qedehên nîvdagirtî û kodika leblebiyên qelandî li ser masê.

Seroknatorê Swêregê Mahmûdê Xezalê, du natorvan pê ra, li kuçeya Qeleboziyê dewriye digeriyan. Gava ji ber parqê derbas bûn, Keriz Cimo deng li wan kir.

“Xal Mahmûd, bê ma het roşê! Ma şima rê çiyê îkram bikerê!”

Mahmûdê Xezalê di bin lêva ra keniya û got.

“Bê araq û esrarê li cem we çi heye law! Ma qey hûn dixwazin ez we bigirim?”

Evdoyê Garisî got:

“Ma çirê tu dê ma tepêşê! Çi zîrarê ma dewletîrê esto, şo xwe rê anarşîtan tepêşê!”

“Li Swêregê kî hebû me girt, êdî em çî bikin!”

“Madem winiyo, nê generalên Enqereyî qandê çîçî hend televizyon û radyoyan dê zirzirî kenê?”

“Çi karê min û generalan bi hev ra heye law? Ew general, ez bekçî!” Got Mahmûdê Xezalê.

Osmanê Topal, li pêş qehwexaneyê xwe mîna dîk rawestiyabû û temaşeyê wan fikir, bangî Mahmûd kir.

“Mahmûd efendî, Mahmûd efendî! Dev ji wan berde, were ez ji we ra çayekê îkram bikim!”

Navbera Osmanê Topal û Mahmûdê seroknatorvan rind bû. Di qoziyekî qehwexaneyê wî da odeyek piçûk hebû. Osmanê Topal di wê derê da qumar didan lîstin. Şevê carê nebe jî, du şeva carê Mahmûdê Xezalê dihat serdana Osmanê Kulek û bertîla xwe jê distand.

Mahmûdê Xezalê, bi herdu natorvanan ra veheriya çû cem Osman.

Keyayê taxa Xeyriyê Zulkîfê Xirabokî li ser kursiyekê rûniştibû û kursiyekê din jî dabû bin çogê xwe. Osmanê Topal ji vê tewir rûniştinê pirr û pirr eciz dibû.

“Malava, hûn kursiyekê dixin bin qûna xwe ne bes e, yekê jî dixin binê çogên xwe! Kursiyên min giş xwar dibin heyran! Wa mekin!” Digot.

Lê ji Zulkîfê Xirabokî ra newirîbû tiştek bigota. Ji xwe ra digot, “merivên sîxur belî nabe, sibe ev rabe li min jî giliyê bike û bibêje, Osman di qehwexaneyê xwe da qumar dide lîstin, ez ê çî bikim!”

Di derheqê “kominîst” û “anarşîstan” da, xelkê Swêregê xwediyê zanetiyek rast û fireh nebû. Lê cardin jî, ji ber çî sedeman bû mirov nizanî, ji sîxuriyê Zulkîfê Xirabokî, piraniya swêregiyan, bi taybetî jî nişteciyên taxa Xeyriyê pirr hêrs bûbûn.

Jinên taxa Xeyriyê, kuç û kevirên Xwedê li ser serê wî dibarandin. Mişteriyê qehwexaneyên Qeleboxaziyê, sîxuriya Zulkifê Xirabokî fena benîşt dicût, galgalên xwe doş dikirin doş dikirin û dianîn ser wî û çî pilîlo bibêjî dikirin. Lêbelê li pêş wî kesî tişteki nedigot.

Ûsoyê Çavbenîşt ji qehwexaneyê Heciyê Kor rabû û berê xwe da mal. Seat ne zû û ne jî dereng bû. Li ser kuçeya Qeleboxaziyê zêde mirov xwuya nedikirin, tenûra Qadoyê Nanpêj vekirî û Qehwexaneyê Osmanê Kulek bi mişteriyên tije bû.

Gava gîhaşt ber parqê, li aliyê rastê silav da Keriz Cimo û Evdoyê Garisî.

“Hewna kergeyî nêrakewtê Ûso, tu sera şinê?” Got Keriz Cimo.

Evdoyê Garisî got:

“Ka no enbazanê to kotîdê rê?”

Ûso di dilê xwe da got, “hele tu li vê qeşmerê Keriz Cimo mêze bike! Min û mirîşkan dike yek.”

Neçar li cem wan rûnişt. Keriz Cimo qedihêk araq dagirt û danî ber Ûso. Qedehên xwe şerqandin hev û “şîrê şêran” bi ser xwe da kirin. Bîstek şûn da, Evdoyê Garisî rahişt qutûya xwe, pincekî titûna Semsûrê danî ser pelê cixarê, perçeyek esrar di nav destê xwe da firikand û tevî titûnê kir û pêça. Evdoyê Garisî, hilmek kûr li cixareyê da û dirêjî Keriz Cimo kir. Cimo jî hilmek lê da û dirêjê Ûso kir. Heta derengê şevê, dawî li sê cixareyên qirmote anîn û derketin ser ewran. Li ber çavê Ûso dinya li bin guhê hev ketibû. Ji araqê ra mezbût bû, lê gava esrar dikêşand, şerpeze dibû.

Bala xwe da ser mişteriyên qehwexaneyê Osmanê Topal û di ciyê xwe da veciniqî. Keriz Cimo destê xwe da ser milê wî.

“Xeyro Ûso, sebî?”

Çavên wî ji şûna xwe lekiyabûn, hewl bûbûn.

“Tişteki tune.” Got Ûso

Ûso çavên xwe firikandin, qurtek av vexwar û car din bala xwe da ser mişteriyên. Dîmena bîstek berê dîtibû, neguherîbû. Di ber xwe da silawet anî û hinek av bi ser çavê xwe da kir.

Keriz Cimo got:

“La hele Ûso marê vacê, no halê to çiçiyê laa?”

Ûso berê bi dimilî bersîv da û dû ra wergerand kurmancî.

“Ez kotîra zana! Hêş û aqil li serê min nemaye, yan jî ez dîn bûme!”

Evdoyê Garisî şaşomaşo bû.

“Tu qandê çiçî xînt benê la?”

“Law ez ji we ra çito bibêjim... gava ez li qehwexaneyê Osmanê Topal mêze dikim, mişteriyên wî li ber çavê min dibin cin û ecnî. Hinekî bi du qoç û hinekî bi çend qîloç in. Guhên hinekan fena evqas dirêjin ku digîjin erdê. Devê wan mîna beroşên kergê fireh, mîna pez û dewaran kayinê dikin. Bêvîlên hinekan mîna xiyaran dirêj, mîna bacanê reş stûr in. Hinek çar pî û hinek jî heyşt pî ne.

Sê serî bi Zulkîfê Keyayê Xirabokî ve ne. Li ser her seriyekî wî du cot çav hene, cotek li aliyekî eniyê û cotek jî li aliyê din. Li ser her seriyekî wî, du dev hene, yek li ser gewriyê û yek jî di navenda serçavê wî ye. Pozê wî tune ye. Ji devên li serçavên wî alaw û pêtî, ji devikên li ser gewriyan tiştêkî mîna qîr dertê. Şeş cot çavên xwe li ser min zîq kirine û xaîn xaîn li min mêze dike.”

Keriz Cimo got:

“La Ûso yasitar... mêrdeko xwe rê ronîştî û çaya xwe şimeno.”

Ûso hêrs bû.

“Ma ez kor im! Vaye ez bi çavên xwe dibînim”, got û rabû ser xwe.

Evdoyê Garisî got.

“Ti sera şinê Ûso?”

Ûso bersîva wî neda, hêl bû û ji parqê derket, çû ber qehwexaneyê. Xencera xwe çend car li ser dîwêr kişand û li hemberî Zulkîfê Xirabokî rawestiya, bi zimanê tirkî got:

“Ûlannn! Yan baxana yan çaxariz haaa!” (Lawww yê ku di binê çavan da li me binêre, em jî di binê çavan da dişerpînîn wî haaa!)

Mahmûdê Xezalê rabû ser xwe, Osmanê Kulek nehêşt rabe.

“Qarişê Ûso mebe, got. Her şev hal û karê me wiha ye. Ew ê hinek qarqar bike û dû ra biçê mal.” Mahmûd li ciyê xwe rûnişt. Ûso mêze kir deng ne ji Muxtêr û ne jî ji yekî din derket, hin zêde hirs bû û ji gişkan ra dûz kişand.

“Qoç û qîloçên kê heye, ez ê di dê û jina wî nim haa!”

Miştêriyê qehwexaneyê, seroknatorvan jî daxil şaşomaşê li hev mêze kirin. Deng ji kesî derneket.

Ûso nihêrî nebû, îcarê got:

“Kî bê bêvil e, ez ê dê û jina wî nim haa!”

Miştêrî cardin bêdeng man, serê xwe li ba kirin. Ûso nihêrî nabe, xencera xwe li ser dîwaran û derebayên dikanan kêşand û heta nêrdewanên kuçeya Qeseban çû û veçeriya û hat li hemberî Muxtêr rep rawestiya.

“Di vê qehwexaneyê da kî muxbîrciye bila destê xwe rake! Ez ê di dê û jina wî nim!”

Kesî xwe neleqand. Muxtar di ciyê xwe da qirqilî, awirê xwe tehl kir û li dora xwe mêze kir.

“La no qey belay xwe geyrano! La Mahmûd ma tu bekçîbaşî niyê? Tu çirê ney nitepişenê?”

Mahmûd û du natorvanên bi wî ra, mecbûrî rabûn ser xwe, Keriz Cimo û Evdoyê Garisî jî gîhaştin wan, bi hev ra tev bi çepî û çîpê Ûso girtin û birin. Li qoziya Mizgefta Emer Axa, Mahmûdê Xezalê got, “law Ûso tu çavê min î, te dilê me rehet kir. Ez ta nabim qereqolê, here mala xwe, rakeve.”

Ûso hêl bû û çû mala xwe. Sibetirê, rabû û çû qehwexaneyê Heciyê Kor. Temamê xelkê Qeleboxaziyê, bi hedîseyê şeva çûnê hesiya bûn. Mişteriyên qehwexaneyê li pêş wî rabûn ser piyan, hinekan gotin, keremke were li cem me rûne, hinekan got, eferim ji te ra, hinekan got, hezar carî biravo, Şefîqê Çavbeloq got, “law wele tu mêr î, axayên Swêregê nikanin avê li destê bikin, vê şûn da ez ê ji te ra bibêjim, Ûso Axa!”

Ûso bû îsotê sor.

“Law ez di dê û jina axayan nim ê û ez di dê û jina Ûso Axa nim jî”. Got. Şefîqê Çavbeloq di xwe da şikiya û di ber xwe da kir pistepist.

“Law bêbext! Em li paş te dimeşin, nabe, li pêş te dimeşin nabe, axrî ez nizanim em çi bibêjin û çi bikin!”

Wê gavê Ûso pirr galgalek xweş û baqil bi lêv kir, wiha got.

“Ji bo çi hûn ê li pêş min yan jî li paş min bimeşin hii, ma em li kêleka hev bisekinin û bi hev ra bimeşin, diha rind nabe?”

Heciyê Kor, çepik lê da û got:

“Elawekîr tu fena aliman qîsa dikî!”

Vegeriya ser dezgevanê xwe û bi dengekê bilind, ferman da.

“Law Elo, ji xalê xwe yê Îso ra çayekê bi namûs çê bike!”

Ûso, li ser kursiyek rûnişt û pişda xwe da dîwêr, şewqa xwe ya sîpertûj bi ser çogê xwe ve daliqand û temaşeyî kuça Qesaban kir.

2012.01.25

**

Ji Qeleboxaziyê keçikeke esmer derbas bû

Weşandin: 24/11/2011 , Paşa Brodrêj

Mîna her rojî, kuçeya Qeleboxaziyê bi tevger û şemate bû. Ji tenûra Qadoyê nanopêj, bêhna nanê teze derdihat û bi ser kuçeyê da belav dibû. Li hemberî qehwexaneyê Heciyê Kor, Osmanê Bêvildirêj yê nalbend li ber

kerekî reş rûniştibû û lingê wî nal dikir. Hedadên esilêrmenî li dikanên xwe, nîr, das, qirim, mer, bivir, tevr, manqal, sobe, nal û her babet feraq û fol çê dikirin. Şerqînî û terqîniya wan guhê meriya ker dikir.

Îboyê Deqo, bêvil û çenga xwe deq kiribû, loma ji ra digotin, Îboyê Deqo, qasî kîloyek tutûna qaçax a Semsûrê, di nav tûrekî kaxizîn da teslîmî berber Mehemedê Meqestûj kir. Mehemedê Meqestûj gûzan di desta da rîha Osmanê Qafgir traş dikir. Destê xwe avêt peran, Îboyê Deqo got, ecela meke, dû ra ez ê ber bi te werim. Osmanê Qafgir got, tu ji min ra jî qasî kîloyek bîne loo, rahme li bavê te!

Îboyê Deqo destê xwe carê bi ser eniya xwe û carê jî bir ser dilê xwe û got, ser seran û ser çavan. Du hefta şûnda ez ê herim Semsûrê, bi destûra Xwedê ez ê ji xalê xwe ra tutûna xweş bînim. Bêguma li Qeleboxaziyê qaçaxçiyên din jî hebûn. Hinek ji wan, titûna qaçax û çay, hinek demançe, derb û tifang û hinek jî esrar difrotin. Mîna golikê beş her kesî wan nas dikir. Xelkê navê wan, ciyê wan zanîbû. Ji kê ra çi lazimbiya, zanîbû ku ew ê here cem kê. Lê Îboyê Deqo, ne mîna qaçaxçiyên din bû. Di nav wan da, yê ku karê xwe herî pak û mezbût dikir, ew bû. Qaçaxçitiya wî û tutûna ku wî dianî, ne tenê li Qeleboxaziyê, di temamê Swêregê da bi nîşan bû. Li ber sîmsarxaneya Çêrmûgê, miawîn hilkêşiyabû ser dolmişê û barê mişteriyên li ser dolmişê girêdida. Xwediyê sîmsarxaneya dolmişên Çêrmûgê, Ebdulbekirê Kolî li ser mişteriyên dilezand. -Hadê babam, hadê babam! Ma berey kewtiyê, wa her kes cayê xwe bigîro!

-Bira kes li erdê nemîna haa!

-Ciyê her kesî belî ye, bira her kes li ciyê xwe rûne!

Nexweşên bê derman, kor, kulek, keçel û kurmiyên Swêregê, jinên korocax, kalepîrên ji mêranîyê ketine, dê û bavên ku ji qîzên xwe ra li qismetekî pak digeriyan, bi zar û zêçên xwe ra tev, bi dia, tekbîr û selawatan li dolmişê siwar bûn.

Germava Çêrmûgê, dermanê her derdî ye, digotin. Kî têkeve nav germava Çêrmûgê, çi mirazê wan hebe, dê were cîh û çi nexweşeya wan hebe dê bibore. Miawîn daket jêr, mişteriyên cîh dan xwe, lê ajoyê dolmişê li holê xwuya nekir. Ebdulbekirê Kolî ortelix li hev xist.

-No efendiyê ma şîyo kotî laa? La hela şîrê bewniyê qehwexaneya Heciyê Kor, bewniyê qehwexaneya Osmanê Kulek!

Li ser qêrîn û qarîna Ebdulbekirê Kolî, miawînê dolmişê û lawê wî Qoço her yek bi aliyekî ve pekiyan.

Heciyê Kor, li ber qehwexaneya xwe, destê xwe li paş pişta xwe girêdabû û temaşeyî helahela Qeleboxaziyê dikir.

Ûsoyê Çavbenîşt, bi şelwerê qebardîn û pişta ecem, sako li ser piyan, şewqe li sêrî, ji aliyê bakûr, xwe li ba dikir û dihat. Navrana şelwerê wî hema hema digîhiya erdê. Awêrê wî tûj û tal bû. Her cara ku guça sakoyê wî bi hewayê diket, kêra ber pişta wî xwuya dikir.

Hecî di ber xwe da got, vaye belayê serê min cardin tê. Xwedê bike bi mişteriyên min ra lec neke.

Gava ew gîhaşt ber qexwexaneyê, Heciyê Kor, piçek bi henekî û piçek bi giranî got.

-Merî newêre li rûyê te mêze bike heyra!

-Hecî, tu jî tam îşê haa, ma va wechê min bexça Welî ye! Ji bo çi tu yê li min mêze bikî? Got Ûso.

-Law Ûso yasitar, tu mîna îsota tûjî law! Merî newêre dengê xwe bike.

-De berde loo! Tu jî derî û tê bela xwe di min digêrîn! Got Ûso.

-Law bêbext, kê ji te ra çi got?

-Ez çi zanim! Çi were devê we hûn dibêjin. Ûso wa meke, Ûso wa mebêje, Ûso bi xelkê ra lec meke..

-Ê ma em xirabî dikin law? Em dibêjin, bi xelkê ra lec meke, tu yê rastî qafilqedayek werî. Ma ji bo xirabiyê em dibêjin!

-Ez ji ku zanim, hûn ji bo çî dibêjin!

-Temam, tamam! Madem ku tu eciz dibî, vê şûnda ez ê devê xwe venekim.

-Vemeke! Kûza avê li riya avê.. Ka tu yê ji min ra çayekê bi namûs bidî ana?

-Çima nedim, ma bi perê xwe nine!

Hecî ji çaygerê xwe ra got, ji Êso ra çayekê binîn.

Qehwexaneyê Heciyê Kor li ser kuçê Qeleboxaziyê, paşîya wê ber bi kelayê û pêşîya wê jî li kuçêya Qesaban mize dike. Êso xwe da ser kursiyekê û qutiya tutûnê ji bêrîka xwe derxist. Bîstik şûnda Seferê Fişîşok û Barût Hesen jî hatin û li dora masê rûniştin.

Wê gavê, yekî ji wan ra bigota; sibe dê qiyamet dakeve, îroj dê erd bihêje, dusibe dê kevir bibare, dê hersiya jî bigotana, dibe dibe, çima nebe! Karê Xwedê qet belî nabe.

Lê yekî bigota, nuha dê keçîkek ciwan û bi pantol, bi îşlik, serqot û bi lêvên boyaxkirî, di lingê wê da qondireyên Êntabê, li ser milê wê çante, ji kuçêya Qeleboxaziyê derbas bibe, ne wan û ne jî yekî din, dê bawerî nekirane. Dê gişka bigotana, Qeşmeriya meke law, rabe here îşê xwe! Kuçêya Qeleboxaziyê li ku û keçîkên elefranqa li ku! Neheq jî nebûn. Rojhilata Swêregê weke “bajarî” û “modern” û aliyê rojavayê jî weke “gundî” dihat dîtin û bi nav kirin. Navenda aliyê “gundiyan”, bê mibalexe Kuçêya Qeleboxaziyê bû. Di beşa gundiyan da, zimanê kurdî (kurmancî, dimilî), di beşa bajariyan da zimanê tirkî, sereke bû.

Di Kuçêya Qeleboxaziyê da her kes bi kurdî dixafî, di dan û stendina xwe da zimanê kurdî bikar danîn.

Cûdabûneke balkêş ya din jî ew bû ku; hejmara wan zêde nebe jî keç û jinên “modern” yên ku li kuçê û kolanên beşa bajariyan xwuya dikirin, li qismê gundiyan fena teberikê zû bi zû peyda nedibûn. Di temamê beşa

gundiyan da, mal û malbatên ku keçên xwe yên ciwan dişandin dibîstanê, hejmara tiliyên destekî nedibihurîn.

Yek ji wan Hec Reşîdê nanpêj bû. Gava xelk pê hesiya ku Hec Reşîd, qîma xwe bi dibistana ewlîn neaniye û keça xwe dişîne mekteba navîn û lîseya ku ciyê wan li aliyê bajariyan bûn, nav û dengê wî derket û tenûra wî bû navnîşana taxa Xeyriyeyê. Êdî gava riya xelkê xerîb, çerçî, hemal, erebeyên hespan, teksî, dolmiş, bekçî û polêsên dewletê, bi taxa Xeyriyê diket, li gorî tenûra Hec Reşîd riya xwe rast dikirin.

Erê, heftê carekê nebe jî, du hefta carekê yan jî sê hefta carekê, jinên taxa Xeyriyeyê bi çarşevên xwe yên şîn, ji ser kuçeyê derbas dibûn û diçûn Hemama Evdal Axa. Hinek caran jinên gundî yên bêçarşev, lê serî bi çefî jî xwuya dikirin. Zarokên keç jî hin caran bi bav û birayên xwe ra ji ser kuçeyê derbas dibûn, hew.

Lewra gava Keçika Esmer ji binya kuçeyê xwuya kir, temamê Qeleboxaziyê, bala xwe dan wê û di ciyê xwe da qerisîn. Çavên her kesî li ser wê zîz bûn.

Çawa nebe?

Di orta Qeleboxaziyê da, li ser keviran bexçeyê kulîlkan vedabû.

Keçik jî çi keçik!

Di çavê wê yên qehweyî da, stêrkê şevên tarî fena mûmên ziyareta Şekoyê vêdiketin û vedimirin. Porê wê yê reş yê mîna qîr, li ber bayê payizê, fena pelê dara tûyê rabûbû govendê. Diranên wê yên mircanîn, di navbera lêvên wê yên sor û gulgulîn da mîna libên henarê Qetînê dibiriqîn.

Lingên wê bi erdê nedibûn. Meriya digot qey li ezmana difire.

Li nêzî nêrdewanên kuçeya Qesaban li ber dikanekî sekinî û li morî û mercanên daliqandî mêze kir. Bazineke ji morîkên rengareng çêkirî, rakir, lê mêze kir û bihayê wê ji xwediyê dikanê pirsî.

Gava keçikê devê xwe vekir, yê n ku çavên wan bi keçikê ketibûn, bêhngirtina xwe rawestand. Guhên wan fena kulîlka mastirikan bûn fireh û li benda dengê wê man.

“Gelo bihayê vê bazinê çî ye?”

Devê dikançî li hev ket, hindik mabû li ser kursiya xwe gêrî erdê bibe. Keçik kenîya û got.

“Baş e, baş e! Ez ê carekê din bêm.”

Kena serçavê xwe pak kir û meşa xwe domand.

Dengê wê, di seranserê Qeleboxaziyê da pêl bi pêl belav bû. Yê n hîna çavê wan li keçikê neketibû, wekî ceyran wan bigire di ciyê xwe da lertzîn û ji hev pirsîn.

“La no çî veng o!”

“La va çî ziman e?”

“La wilahî no vengê melakan o!”

“Bi serê Keko Mewloyê swêregî ez sond dixwim ku perî nikanin avê li destê xwediyê vî dengî bikin!”

Teswîra herî xweşik ji devê Îboyê Deqo derket. Gava sewta keçikê ket ber guhê wî, wiha got.

“Ev dengê fena ava kaniya Serebê zelal, mîna tiriya tanebî şîrin û weke baûhewa Qerecdaxê hûnik ji ku tê?”

Erê! Mişteriyên qehwexaneya Osmanê Kulek, ku Keçika Esmer hîna ji wan xwuya nedikir, li ser wê sewtê, ketin niqaş û lêkolînên hûr û kûr. Neheq jî nebûn! Li hemberî dengê bi wî awayî kê dikanîbû guhnedêrî nîşan bida, kê dikanîbû berê xwe bada.

Dengê wê mîna dengê bilûra şivanê kurd bû. Di deşta Qerecdaxê da gupînî bi dilê meriya dixist û xwîna meriya dikeland.

Di binê birûyên hîlalî de, bijangên wê mîna tîrkevanan li ser dilê meriya didaçiqîn.

Xwe li ba dikir û dimeşiya. Ax di bin piyên wê de dihejiya. Dilê xortan li ser agirê kizirî û heliya. Kalepîrên ber dîwaran axînî, xortan keser kişand. Ya ew bêhna wê! Ew bêhna ku ji wê radibû heş û aqil li ser meriya nedihêla! Merî pê ve serxweş dibû û bi ezmana diket, dîn dibû bi çolan diket. Bêhn wê, fena bêhna dara sincê û gula rahmanî, fena şemamokên gundê Dîndarê bû.

Ew serçavê esmer, ew lêvên fena xewxanan, mîna leylenokê çolan rê li ber meriya şaş dikir, çogê meriya sist dibû, destê meriya dilerziya û galgalên meriyan ji hevda diket.

Temamê esnafê Qeleboxaziyê, tamamê neferên li ser rê û pîyaran, mişteriyên qehwexaneyên Osmanê Kulek û a Hecîyê Kor, mişteriyên dolmişa Çêrmûgê, cumle dikandarên Qeleboxaziyê, heta û heta kûçik û pisikên ber dîwaran jî sekînin û li wê mêze kirin.

Guzana destê Mihemedê Meqestûj, çakûça Osmanê Bêvildirêj yê nalbend li hewayê ma, tepsiya çay ya li ser destê şagirtê Osmanê Kulek şemitî û ket erdê, qedehên newqziraf bi terqînî û şerqînî li ser kevirên kuça Qeleboxaziyê perçe perçe bûn.

Kesî xwe nelivand û li aliyê şagirt û qedihên wî mêze nekir. Çav û bala gişka li ser wê bû. Her gava wê, her tevgera masûlkên dest, ling û serçavê wê, bejn û giraniya wê bênavber dişopandin û dinirxandin.

Bixwebawerî û serbilind dimeşiya. Li dora xwe mêze nedikir, lê cardin jî meriya digot qey ew çardoraliyên xwe dibîne û dişopîne. Kî, li ku sekiniye, wêne û dirûvên wan çi ye, di mêjî û dilê wan da çi fikir, çi hest çê dibin, dizane û texmîn dike.

Meriya digot belkî, hema ew ê a nuha di cîh da çiv bide xwe, çardexwurek belçikî ji ber xwe bikşîne û çardeh derbî li ser meriya vala bike.

Ew awirê bibiryar û giran, fena ku ji meriya ra bibêje; nebe nebe tu xwe bileqînî! Di mêjiyê nav tasika serê te da çi rindî û xirabî derbas dibe, ez

dizanim û dibînim. Eger tu bi niyeta xirab xwe bileqînî, ez ê te di cîh da bikim serad!

Li goşa Mizgefta Emer Axa, li ser milê çepê zivirî û ji ber çavan wenda bû. Mîna xewna şevan hat û çû.

Temamê merivên li kuçeya Qeleboxaziyê weke ji xewê şiyar bibin vegeyriyan ser karê xwe. Şagirtê qehwexaneya Osmanê Kulek, bi gêziya qamişîn dest bi maltina camê perçeperçeyî kir. Osmanê Bêvildirêj, çakûça xwe ya li hewayê mayî, şirqand ser bizmara nala kera reş. Nîvê bizmarê, simê kera reş qul kir û ji aliyê jorîn derket der. Mehemedê Meqestûj gûzana xwe danî ser rîha Mistoyê Qafgir û pirçê ser gepa wî anî xwarê û di ber xwe da bi miçemiçê got.

Merî çî dibîne û çî nabîne!

Mistoyê Qafgir hewl da xwe ku serê xwe li ba bike, çend qisan jî ew bêje, lê zû hay li xwe bû. Gûzana di destê Mihemedê Meqestûj da li ser gewriya wî diçû û dihat. Xwe nelaqand û devê xwe venekir.

Keriz Cimo û şirîgê wî Evdoyê Garisî yên ku di nava Parqa li hemberî tenûra Qado da êzing difirotin, her tim serê wan bi mij û dûman bû, li ser barê êzangan rûniştin. Çavên wan hêja li ser goşa Mizgefta Emer Axa mabûn.

“Wa Elah qismet bikero ez ey fina bivîna, wa emrê min jî rojê bo!”

Evdoyê Garisî paşda nema. Got:

“La tu sevanê Cimo! Wa ez ey fina bivîna, şar panc finî nimaz keno, e do des finî bikera. Cinet Cinet vanê, Cinet no yê îşte oxlim! O cineta bîn ko her kes qalê cê keno, wilahî bîlahî zûro yo!”

Mîna pêtaga mêşin hungivê, xumînî bi kuçeya Qeleboxaziyê ketibû. Neferên ku çavên wan li Keçika esmer ketibûn, tenê li ser wê qise dikirin. Hinekan serê xwe sipartibû kefa destê xwe û wisa bêdeng diponijîn.

Li ber qehwexaneyê Heciyê Kor, Êsoyê Çavbenîşt û hevalên wî ketibûn qirika hev. Êsoyê Çavbenîşt bi hazircewabî û zimandirêjiya xwe, dor nedida kesî. Bi hizrên bêserî û bêbin, li ser eslûfeslê keçikê şop diajot û gurmista xwe li ser masê dixist.

“Ez bi serê gora Qoçuyê Heftpalik, heft caran sond dixwim ku ez vê keçikê nas dikim!”

Hevalê wî yê maseyê, Ahmedê Pozqut ling avêtibû ser lingan û tizbiya xwe ya Erzorimê dikişand, bi awayekî sinûx got.

“Êso tu carna derewan dikî!”

Êsoyê Çavbenîşt ji ser kursiyê firiya hewayê û dest avêt şewqa ser serê xwe û şewqa xwe li orta maseyê xist. Temamê mişteriyên galgalên xwe birîn û di bin çava ra li wan mêze kirin.

“Bi namûs û şeref ez derewan nakim! Yê derewan dikin, qeşmerên fena te ne lawo!”

Ahmedê Pozqut awirê xwe qet xira nekir.

Seferê Fişfişok û Barût Hesên jî li dora masê rûniştibûn. Ketin navbera herduyan û gotin, wiha mekin, eyb e! Xelk me temaşe dike.

Li ser vê yekê Êso tew bû arpizot û xwe hîn zêde tûj kir û got.

“Li vê erdê Swêregê, tiştên ku ez pê nizanim û kesê ku ez nas nakim tune ye!”

Ahmedê Pozqut bi dengekî nizim got.

“Ka de ji min ra bibêje, ev keçika kî ye, ji ku tê û diçe ku?”

Êsoyê Çavbenîşt qasî bîskî fikirî. Erê, dirûvê keçikê dişibî swêregiyên, ji meşa wê jî xwuya dikir ku keçik ne xerîb bû, li ber dûkana morî û mercanan kurdî axifî bû, îcarê çî kurdîkî xweş û zelal, dibe ku keçik ji taxa bajariyan, dibe ku ji Diyarbekirê hatibû, meriyê ji ku bizanibe.

Ahmedê Pozqut pirsê hêsan pirsî bû, lê bersîvek rast li cem Êso tune bû.

Bi fors û fortan ji xwe ra faqekî çêkiribû û ketibû faqa xwe. Biavêta kîjan aliyê nikanîbû xwe ji feqê xelas bikira.

“Law Ahmed! Qeşmerê mîna te çawa dikane ji min ra bibêje, derewçîn ûlan!” Got û dest avêt kêra xwe.

Xwediye Qehwexaneyê Heciyê Kor, gavekê wê da, li kêleka wan rûniştibû û bi çavê xwe yê saxlem li nêrdewanên kuça Qesaban mêze dikir û li Keçika Esmêr difikirî, di bin çavan ra dît ku Êsoyê Çavbenîşt kêra xwe kişandiye û dike Ahmedê Pozqut kêr bike, rahişt kursiya bin xwe û bi tundî li serê Êso xist. Kursî li ser serê wî perçeperçe bû û ji hev felişî. Kêr ji destê Êso ket, qasî saniyekê li ser pêya liba bû û dû ra jî xewirî û ket ser masê. Maseya nizmik di bin giraniya laşê wî da şikiya û bi erdê ve zeliqî. Heciyê Kor rahişt kursiyeke din, li ciyê xwe yê berê rûnişt û di ber xwe da got:

“Law Êso çi nerindî heye ji te derdikeve! Min ji te ra negot, bi kesî ra lec meke hiii! Salan mehan carê me xewneke xweş dît, te nehêşt em tahma wê bigirin, bênamûs!”

**

ÇÎROKÊN MALPERA NEFEL

Fala Nûrikê

» Firat Cewerî STOCKHOLM, 7/2 2009 — Şevreşeke nîvê payizê bû. Şax û pelên darên sêvan yê li hewşê ji ber bayê sivik dikirin xuşînî. Bi dengê girîna ewr re Gulê bi qîrîn ji xewê şiyar bû. Ew di xwêdanê de mabû. Ji ber giryê di xewnê de hê jî îskîna wê daneketibû. Bi dengê qîrîna wê re mêrê wê jî ji nava nivînan pekiya û tavi lê lampeya li ber serê xwe pêxist.

– Çawa bû, ma qolincên te tî? mêrê wê bi çavlixewî jê pirsî û ji bo ko wê haş bike destê xwe avêt ser stuyê wê.

Gulê jî xwe avêt hembêza wî û bi dengê bilind û bi îskînî giriya.

– Çi bûye, cana min? mêrik bi tirs û kelecana jê pirsî. Ji bo çî tu digirî?
Jinikê tu bersiv neda, giryê xwe bê rawestan domand; piştî ko demekê bi wî awayî giriya, paşê gava xwest tiştê ji mêrê xwe re bibêje, ji ber îskîna pir kir û nekir nikarîbû gotina xwe bibira serî. Lê mêrê wê yê bîrbir, hêdîka destên wê ji nava xwe berdan, rabû ser xwe û çû ji mitfexê jê re qedehê av û hinek kaxiz anî. Wî qedeha avê dirêjî jina xwe kir û dû re li ser qeryole, li kêleka wê rûnişt. Piştî ko jinikê çend gulp ji qedehê vexwarin û qedeh danî ser maseka piçûk ya li ber serê xwe, mêrik bi tilîkên xwe porê wê yê ko ji xwêdanê bi eniya wê ve zeliqîbû da alî û ji bo ko wê haş bike hêdîka eniya wê maçî kir. Jinikê xwe di wê kêliyê de êmin his kir, ji ber hezkirin û pêdaketina mêrê xwe hindik be jî hem ew xewna ko di xewê de mîna jiyaneke dûdirêj, ya bi êş û ezab, hem jî ew kabûsê ko ev nozdeh sal bûn destên xwe xistibû qirika wê, ji bîr kir, lê dîsan tavilê tirsê wê hatiyê, laşê wê lerizî, vê carê guhertineke bêhawe di rûyê wê de peyda bû. Gava mêrik rabû û xwest ji texsiyê re telefon bike, wê nehişt û ji mêrik re got ko hê qolincên zêde nehatinê. Li gora hesabê ko hemşîreyê ji wan re gotibû, çar roj di ser dema wan re buhurîbûn. Ji ber ko li ber guhên mêrik ketibû, ko zarokên dereng çêdibin, lawik in, kêfa wî dihat, lê ji aliyê din ve jî dixwest rojekê zûtir jina wî, ya ko zikê wê li ber dev bû, ji wî ezabî xelas bibe.

– Ez dibêjim wê îro çêbibe, mêrik got û di bin kirasê wê yê şevê re destê xwe danî ser zikê wê yê mezin û girover.

Zaroka ko êdî di hundir de aciz bûbû û dixwest derkeve derve û tevî xweşî û nexweşiya jiyana mirovane bibe, mîna gilokekê hilkişiya jor û bi xurtî xwe bera jêr da.

Vê carê ji bo ko jinik jî bibîne, mêrik kirasê wê hilda jor û bi kêf li tevgera zarokê temaşe kir. Ew benderuha di zikê jinikê de mîna perpîtandina mirîşkeke serjêkirî diperpitî. Jinikê di wê navê de awirên xwe yên bi tirs

berdabû ser mêrê xwe û bi kelecana li bendî reaksiyona wî bû. Mêrik jî ziq bala xwe berdabû ser zikê wê yê ko bêhawe mezin bûbû û li liv û tevgera zaroka xwe temaşe dikir. Gava mêrik ji nişka ve bêdengî his kir, serê xwe rakir û li jina xwe nerî. Rûyê jinikê bûbû mîna yê miriyekê, xwêdaneke mîna zîpikê li ser eniya wê peyda bûbû. Mêrik bi destê xwe ew xwêdana cemidî ya li ser eniya jina xwe paqij kir û kirasê wê bi ser zikê wê ve berda. Paşê li gora şîreta hemşîreyê, wî xwest jina wî rabe û di hundirê malê de li ser xwe bigere. Hemşîrê ji wan re gotibû heger ew li ser xwe bigere wê devê malzarokê fireh bibe û di çêbûna zarokê de wê jinik zêde êş û zehmetiyê nekişîne.

Jinikê bi ya mêrê xwe kir û bi giranî, bi alîkariya destên xwe herdu lingên xwe ji qeryole berdan jêr û li ser lingan rawestiya. Qolincên wê jî êdî dihatinê û ji rewşa wê diyar dibû ko wê îro zaroka wê were dinyayê.

Her ko jinikê nêzîkî li çêbûna zarokê dikir, mîna ko ruhê wê jê bikişe, rengê rûyê wê dihat guhertin, dilerizî, xwêdan dida, carinan xwe dispart pencerê, serê xwe ditewand, digiriya, diqîriya... Her cara ko mêrik dixwest ji texsiyê re telefonê bike û wê bibe nexweşxanê, jinikê digot hê qolincên wê zêde nebûne û nedihîşt ko mêrê wê telefonê bike. Du caran gava wê ji bo hewagirtinê pencere vekiribû, ji nişka ve hiseke ko ew xwe di pencerê re biavêje hatibûyê, cara duduyan mêrê wê bi zorê destên wê ji hesinên pencerê vekiribûn, bi şidet pencere girtibû û ew ji ba pencerê bi dûr xistibû.

Bi hebekî rohnîbûna derve re baraneke xurt dest pê kiribû. Libên baranê mîna zîpikê li pencerê dikirin tipînî. Ji pişt xênî jî dengê şirika avê ko li naylonekê diket, dihat.

Mêrikê ko bi tena derpiyê kinik bû, bi herdu destan jina xwe hembêz kir û bi wê re çû mitfaxê. Gava jinikê xwest li mitfaxê li ser kursiyekê rûne,

mêrik şîreta hemşîreyê di bîrê de anî û da xuyakirin ko ew li ser xwe bigere wê jê re çêtir be.

Jinikê herdu destên xwe danîn ser tihêlên xwe û hêdîka çû vî serî û wî seriyê mitfaxê. Mêrik jî bi tena derpîkê kinik çaydan nêvî av kir û danî ser ocaxê.

– Ez ditirsim Kerem, jinikê bi stuxwarî ji mêrê xwe re got. Ez ji vê zaroka di zikê xwe de pir ditirsim.

Kerem lê vegeriya, ew hembêz kir, eniya wê maçî kir û got:

– Em ne li welêt in, tu dizanî ko doktor û hemşîreyên vir ji dê û bavên mirov bêtir li mirov miqate ne. Teknîka vir li pêş e, personal ji dil in, nexweşxane paqij in...

– Lê ne ji wê, jinikê got û lêva wê ya jêr lerizî.

Kerem dîsan li ber geriya, ew hembêz kir, maçî kir, jê re behsa paqijiya nexweşxaneyan, dostaniya hemşîre û doktoran kir; lê kir û nekir jinik haş nebû. Gava jinikê ji nişka ve got: "Ez dixwazim tiştêkî ji te re bibêjim", mêrik bi carekê ve sar ma, digel ko dizanîbû ji sedî sed ew zarok ji wî ye, dîsan jî ket şikeke giran.

– Ev pênc sal in min ji te veşartîye, Kerem. Lê êdî ez nema dikarim xwe bigirim, divê ez ji te re bibêjim.

Keremê min û te, mîna xwîn jê kişiya be, di cihê xwe de bê tevger rawestiyabû û zer bûbû. Ev pênc salên ko jina wî jê veşartibûn, çi bû gelo?

– Erê, ev tam nozdeh sal in, fala Nûrikê mîna kabûsekî pêxîla min bernade. Tiştên ko wê nozdeh sal berê di fala xwe de gotine, ez wan roj bi roj dijîm û ev yeka ha jî min bêhawe ditirsîne.

Hebekî bêhna mêrik hat ber wî, bi lez çû odeya razanê, qutikê xwe li xwe kir û dawiya fala Nûrikê ko ev nozdeh sal bûn mîna kabûsekî destê xwe xistibû qirika jina wî, meraq kir; meraq kir, lê bi qerf jê pirsî:

– Tu bi Xwedê kî ev çi fal e Nûrikê ji te re vekiriye, ko te heya niha ji bîr nekiriye?

Jinikê bi kelûgirî got:

– Ji xwe her ko ez behsa tiştên wilo dikim tu henekê xwe bi min dikî, tu bi min dikenî. Loma min heta niha fala xwe ya berî niha bi nozdeh salan ji te re negotiye. Lê ez ê niha bibêjim. Tu henekê xwe bi min dikî, tu bi min dikenî, tu bawer dikî bawer nakî tu bi kêfa xwe yî, yê min ez ê ji te re bibêjim.

Erê, berî bi nozdeh salan bû. Weke niha tê bîra min. Navrojeke roja çarşemê bû. Havîn bû; ez, diya min, cîrana me Ezîza û xaltîka Siltê em li hêwana me ya ko deriyekî wê li rê vedibû, rûniştîbûn. Me çaya piştî firavînê vedixwar. Ê tam di wê navê de, Nûrikê, mîna her tim kincên wê yên zilamane lê bûn, çefiya wê li serî bû, gopalê wê di dest de bû û di kuçê re derbas bû. Cîrana me Ezîza hema ji cihê xwe pengizî û got:

– Weleh ez ê bang Nûrikê bikim û falekê pê bidim vekirin.

Ji xwe diya min jî li hemana bû, hema wê falciyek li derekê bidîta, ji bo birayê min Yasîn falek vedikir. Hingî du salên birayê min Yasîn li Almanyayê qediyabûn. Diya min ji derdê wî ne dixwar, ne vedixwar û ne jî xweşik radiza. Digooût û li xwe dixist. Neyse, Nûrikê dageriya hundir, gopalê xwe sipart dîwêr û li ser mînderê çarmêrkî veda. Nizanim gelo Nûrika Şabanî tê bîra te? Ew mîna zilaman e, lê navê wê Nûrikê ye. Hinek dibêjin nêrûmê ye. Welhasil, ez tavilê rabûm çûm mitfaxê û min ji bo falê qehweyek da ser. Fala pêşî diya min ji bo birayê min da vekirin. Lê wê ji Nûrikê re qala birayê min nekiribû û haya Nûrikê jî ji çûyîna birayê min ya Almanyayê tune bû. Diya min niyeta xwe di dilê xwe de gotibû. Nûrikê bi binikê fîncanê girt û ew wilo hêdîka di nava destê xwe de bir û anî û weha mîna ko tiştinan dibîne lê baş ne zelal e, bi rûyê xwe yê qermiçî lê nerî.

Em hemû bêdeng mabûn û çavên me li wê bûn. Piştî ko wê çend caran fîncan nêzîkî çavên xwe kir û ji xwe bi dûr xist, dest pê kir û got:

– Li welatekî dûr xortekî pak xuya dibe. Du kes pêxîla vî xortî bernadin. Yek jê jineke navsal, porgijikî, yê din jî mêrekî qut î qalind e. Lawik dixwaze ji wan xelas bibe, dike nake nikare. Ha biner biner, li vî alî jî malek xuya dibe.

Wê fîncan ber bi diya min ve dirêj kir û bi tiliya xwe ew mala ha nîşan da. Diya min jî mîna ko xwîna wê jê kişiya be, zer bûbû û ziq li wî xaniyê ko Nûrikê nîşan dida, nerî.

– Erê Wele, ez dibînim, diya min bi bawerî got.

Heya wê çaxê jî min baweriya xwe qet bi falan nedianî. Tew ez bi xelkê dikeniyam. Min digot ew çawa baweriya xwe bi derewên wilo tînin. Lê tiştên ko Nûrikê di derbarê birayê min de gotin, hemû rast bûn.

– A di vê malê de jinebiyeke porzer rûdine, dil ketiye xort, dixwaze pê re bizewice. Ew jina porgijikî û mêrikê qut î qalind ji ber nelihevkirina siyasetê ketine qirika wî.

Dîsa fîncan dûrî xwe girt û nêzîkî xwe kir û peyva xwe domand:

– Ev berê hevalên hev ên siyasî bûn, yanî di partiyekê de bûn, lê niha navbera wan xerab bûye, an jî lawik hebekî ji siyasetê sar bûye û dixwaze bi wê jinebiya ciwan re bizewice; lê hevalên wî hin tiştan dixin stuyê wî, ew jî çî ye baş ne xuyaye.

Wê fala Nûrikê kiribû ko em hemû di cihê xwe de sar bibin. Tam berî wê bi du rojan birayê min nameyek şandibû, te digot qey ew nameya birayê min pêşî ketibû destên Nûrikê û paşê ji me re hatibû. Hemû tiştên ko Nûrikê digotin rast bûn. Hingî min xwest ew ji min re jî falekê veke. Lê pêşî cîrana me Ezîza ket ber min. Yê wê jî ko hema falciyek bidîta fal vedikir. Nizanim te Ezîza nas dikir? Ez bawer nakim, gava tu derketî, ew hê zarok bû. Keça apê Smaîl... Jineke wek lampekê ye, bavê wê ji çikûsiya

xwe ew da kalekî. Gerçî mêrê wê gelekî jê re baş e, lê xortek di dilê wê de bû û ew her li wî xortî difikirî. Fala ko Nûrikê ji bo wê jî vekir, li gora dilê wê bû. Li gora wê hemû tiştên ko Nûrikê gotibûn, rast bûn.

Gava Kerem têgihîşt ko çîroka fala Nûrikê dirêj e û çav li rewşa wê û qolincên ko tîrê ket, ji hemberî wê rabû, ket bin milê wê, ew rakir ser lîngan û jê xwest ko ew hem li ser xwe bigere, hem jî behs bike. Wê jî mêrê xwe neşikand, rabû ser xwe, destekî xwe avêt ser stuyê mêrê xwe, destê din da ser newqa xwe, hem meşîya û hem jî got. Lê rûyê wê zer bûbû, xwêdanekê ew girtibû, tirseke bêtarîf ji çavên wê difûriya.

– Wê rojê min jî ji xwe re falek vekir. Tu ya rastî bixwazî, baweriya min qet bi falan nedihat. Lê gava Nûrikê di fala xwe de rewşa birayê min raxist ber çavan û hemû falên wê li gora dilê Ezîza bûn, min jî xwest ez ji xwe re falekê vekim. Erê, tevî ko baweriya min bi falan nedihat, lê gava dora min hat û Nûrika falcî rahişt fîncana min, ji kelecane dilê min bû mîna çûkekî perpitî, te digot qey wê hundirê min were xwarê. Min pir bi kelecane lê guhdarî kir. Wê jî bi hostetî rahişt fîncana min, di nava destê xwe de bir û anî, dûr û nêzîkî çavên xwe kir, geh li min nerî, geh li fîncanê nerî, geh rûyê xwe tîrş kir, geh qermîçokên ecêb li eniya wê çêbûn, geh serê xwe hejand, geh nexwest bibêje; lê ez wek li ser êgir bûm, min jê rice kir ko ew rastiya fala min ji min re bibêje. Û wê jî got... Got binere keça min, tu keçikeke pir bîaqil î, tu qenc î, lê wê bîaqilî û qenciya te nîkaribe tu tesîrê li pêşeroja te bike. Tu ê nîkaribî li hemberî qedera xwe rabî û celebê jiyana xwe biguherî. Mirovên mîna te ji hezarî, belkî ji deh hezaran, belkî ji milyonan yek e. Yê wek te pir nêzîkî Xwedê ne. Qedera wan li eniya wan hatiye nivîsandin, lê cihê wan cenet e. Cihê te jî cenet e. Tu ê di vê jiyana kurt de, li vê dinyaya derewîn hem rojên xweş û hem jî yê nexweş bîbînî û bijî. Hem rojên te yê xweş hem jî yê ne xweş, ji pêşî ve ji aliyê Xwedê ve hatine nivîsandin. Niha emrê te şanzdeh e. Tu ê tam not û neh salan

emir bikî. Not û neh sal bi para her kesî nakevin. Xwedê bi tenê yê ko jê hez dike, bi qasî navê xwe, dike ko ew emir bike. Lê di vî not û neh salî de, jiyana te roj bi roj hesabkirî ye. Tu ê li gora hesêb bijî. Mesele tu ê îşev xewnekê bibînî. Tu ê di xewnê de bixwazî bifirî lê tu ê nikaribî. Tu ê bixwazî birevî, lê tu ê nikaribî. Paşê tu ê çentekekî biçûk bibînî. Bi qîmeta not û neh zêran pere di wî çentekî de heye. Divê tu cihê wî çentî baş di bîra xwe de bihêlî û sibehê zû, gava tu ji xew rabî, berî ko tu taştê bixwî, divê tu herî wî cihî. Tu ê li wî cihî wî çenteyî bibînî. Tu ê pereyên di wî çenteyî de di nav destmalkekê de baş girêbidî û di nava lihêfa şîrikî de veşêrî. Ew pere wê têra te û heta zewaca te bike. Heta zewaca te lê, berî ko tu bizewicî tu ê xortekî nas bikî. Xort pir spehî ye, wê li dû te bigere, lê tu ê guh nediyê. Bi tenê şevêkê tu ê li ser wî dêhn bibî. Tu ê bixwazî wî hembêz bikî, wî maçî bikî, wî mist bidî. Wê şevê jî wê ne diya te, ne jî bavê te li mal be, wê kes tunebe. Tu ê bi tenê li mal bî. Wê xwestekê, şehwetek were te ko pê hemû laşê te bilerize. Tu ê bi nefsa xwe nikaribî û tu ê laşê xwe yê terr bispêrî xortê çeleng. Lê wê xort ji nişka ve wîda bibe. Tu ê êdî nema wî bibînî. Heta salekê tu çav li kîjan xortî bikevî, tu ê bi çend gavan bi dû de biçî û tu ê bi dengekî nizim bang bikî. Gava tu bibînî ne ew e tu ê bi şermokî serê xwe bera ber xwe bidî û bi paş de vegeêrî. Piştî bi salekê tu ê xewnekê bibînî, wê xewn bîst salî têxe navbera windabûna xort. Wê ew dem bike ko tu êdî wî xortî bi tamamî ji bîr bikî. Lê di hefteya pêşî ya salê de, yanî tam gava tu ê têkevî hivdehsaliya xwe, wê li bajarekî nêzîk tirimpêlek li te biqelibe. Wê şifêrê tirimpêlê ew xort be. Lê tu ê wî nas nekî. Wê ew xort te rake nexweşxanê, destê te yê şikestî bicebirîne û te bîne li nêzîkî mala te deyne. Wê ew bûyer jî ji te re mîna xewnekê were. Tu ê heta bîstsaliya xwe weke her kesî bijî. Lê tu ê bi cenawirê di hundirê xwe de nehesî.

Di vir de ayeaya wê zêdetir dibe. Mêrê wê li dora wê diçe û tê, lê nizane wê bi çi awayî alîkariya wê bike. Ew jî bi kelecana bûye, digel ko hisa dilxerabiyê di hundirê wî de tevdilive jî, dîsan dixwaze bi rastî li jina xwe guhdarî bike. Dixwaze sirên wê yên veşartî bibihêze.

Jinik hem diçe û tê, hem jî dibêje:

– Min hingî jê re got, çi cenawir? Gelo çi cenawir di hundirê min de heye? Ka bibêje!

Wê got ew ê paşê were ser wê jî. Lê got, tu ê di bîst û yeksaliya xwe de kirasekî bikirî, tu ê bi tenê carekê wî kirasî li xwe bikî û wê ew kiras winda bibe. Piştî bi şeş mehan tu ê wî kirasî li cîrana xwe bibînî, lê tu ê jê re tiştêkî nebêjî.

Qolincên wê zêdetir dibûn. Her ko diçû mêrik jî bêçare dibû. Lê ji nişka ve pengizî û ji texsiyê re telefon kir.

Heta ko teksî hat, jinikê di rewşeke xerab de serpêhatiya fala xwe dom kir. Lê bi kurtî behs kir:

– Û wê got, tu ê di sihsaliya xwe de bizewicî û biçî Almaniyayê, wê pêşî zarok ji te re çênebin, tu ê di sihûpêncsaliya xwe de bi zaro bibî...

Dengê girîna texsiyê ji hewşê hat. Jin û mêr, bi hazirî, bi çenteyekî daketin jêr. Şifêrê texsiyê yê navsal û bejindirêj, silav li wan kir û bi kêf meraq kir ka gelo ava jinikê hatiye an na. Mêrê jinikê, yanî Kerem, got hê av nehatiye; û alîkariya jina xwe kir û ew di deriyê dawiyê yê ko şifêr ji wan re vekiribû re xist hundirê texsiyê. Şifêr pêl li gazê kir, xîzîniyek ji tekeran anî û zivirî ser riya nexweşxanê. Herçiqas şifêr xwest bi wan re sohbetê bike jî, lê hem jinikê xwest çîroka fala xwe ji mêrê xwe re dewam bike, hem jî mêrik xwest li dawiya çîroka fala jina xwe guhdarî bike.

Erê, jinikê qal kir, lê bi nalenal qal kir:

– Û Nûrika falcî got, wê di sihûpêncsaliya te de Xwedê benderuhekî nêr bide te. Belê, negot wê Xwedê lawikekî bide te. Û got, ev benderuh

bermayê tovê wî xortê ko tîna te ya şehwetê şikandibû ye. Û ev benderuh ne mirov, lê cenawir e; wê duserî çêbibe û ji mirovatiyê re musîbetek be. Mêrik di wê navê re destê xwe danî ser devê wê û nehişt ew qala fala xwe bike. Digel ko tirs mîna bizotek agir ketibû dilê wî jî, dîsan wî bi destê xwe yê rastê zikê wê mist da û bi gotinên xweş û hêvîtiyê xwest jina xwe ji wan xeyalên tirsê bi dûr bixe. Lê herdu jî di nava xeyalên tirsê de vedigevizîn. Bi taybetî jî. Avahî, insan, otomobîl, her tişt li ber çavên wê dibûn mîna cenawiran. Gava ew ji texsiyê daketin û ketin hundirê nexweşxanê, dengê qîrîna wê hemû doktor, hemşîre û mirovên li nexweşxanê di cihê wan de sar kirin. Mêrê wê bi lez destê xwe danî ser devê wê, ew haş kir û bi gotinên xweş li ber dilê wê da. Paşê hemşîran ew li odeyekê dirêj kir, bi dostanî û bi devkenî dest bi kontrola wê kirin. Çavên jînikê beloq bûbûn û ziq li hemşîran dinerî. Hemşîra navsal û bi tecrube, bi desta xwêhdana eniya jînikê paqij kir û bi devkenî jê re got ko devê malzarokê fireh bûye û piştî demeke kurt wê zaroka wan were dinyayê.

Paşê hemşîre derketin û jin û mêr bi tenê li hundir man. Mîna ko hebekî bêhna jînikê fireh bûbû, lê qolinc li ser qolincan dihatinê. Her qolinc ko dihatiyê jî ew weke darekî, hişk dikir. Piştî ko hemşîran bi lez li dosya wê nerîn û dîtin ko her tişt normal e, dîsan hatin serdana wê. Devê malzarokê firehtir bûbû û loma wan tavilê jînik rakirin odeya zayînê. Kincên wê jê kirin û kirasekî spî lêkirin. Paşê ew li ser text dirêj kirin, çend behlîf xistin bin pala wê û çîmên wê ji hev kirin. Piştî ko ew tam ji zayînê re amade kirin, pîrikê (ebeyê) jê re got ko divê ew carê bêhna xwe bigire û berde û gava qolinc tîne heta jê tê xwe biesirîne. Wê jî bi ya pîrikê kir û zêde neajot ew benderuhê di zikê jînikê de şemitî jêr. Pîrikê bi lez rahiştê, bilind kir û bi dilşahî got:

– Lawik e!

Lawikbûna wî diyar bû, ji ber ko gava pîrikê ew bilind kir wî beliqand ser diya xwe.

Mêrik dikira ji kêfan bifiriya. Lê dema pîrikê lawik danî ser singa diya wî, dîsan qîrînek bi jinikê ket, lawik ji ser singa xwe dehf da û her bi qîrîn got: – Kereem! Vî cenawirî wê de bibee!... Ma tu pirça wî nabînîî?... Ma tu herdu serên wî nabînîî?... Ma tu qermîçokên eniya wî nabînîîî?...

Ji kitêba »Romanseke çilmisî«, 2002

Nivîskar: FIRAT CEWERÎ

Weşandin: 2009-02-07

Xwendin: 10361

Çîroka Zebeşo

» Hesên Huseyîn Denîz— Ji wêjeya vegotina peyvikî ya kurdan çîrokeke klasîkî ya evîndarî —

Di vê dinyê de ti jin qasî jina kurd di bin zilmê de û mazlûm e nîne! Ez vê pirtûkê di kesayeta dayika xwe ya ji tevan zêdetir, bi zulma zilamtiyê re rû bi rû ma û ji tevan mazlûmtir bû; diyariyê giyana tevahiya jin û dayikên kurdan dikim.

Di şevên zivistanê yên sar û seqem de xwe bê xew dihişt û ji bo em bi dilxweşî xew bikin ev çîrok û gelek çîrokên din ji me re vedigot. Gora wê û ya hemû dayikên kurdan buhişteke bê zilamtiyê be!

Di rojêke dîrokê de, welatek xwediyê çiyayên bilind, geliyên kûr, newalên fireh û beriyên bê ser û ber hebû. Li vî welatî du golên mezin, du çemên kûr û fireh û du evîndarên bi evîna xwe şa nebibûn hebûn. Yek ji vana Ro ya keça Padîşahê wî welatî bû, yek jê jî Zê yê kurê gavanê wî welatî bû.

Ro keçeke bejin zirav a weke tayeke rihanê bû ko dema derdiket ser şaneşîna qesra bavê xwe, hesreta xort û ciwanan bû ko bikaribin bêhnekê li ber dîwarê qesrê rawestin û ji xwe re li bejn û bala wê binêrin. Guliyên porê wê yên li ber tîrêjên tavê bi heft rengan diterisîn dadiketin heta pehniya wê û keziyên ko xwe berdidan ser hinarkên sêvînî yên ruyê wê, bi her livandina serê xwe re agir berdida nava dilê xort û ciwanan. Keskahiya çavên wê ji keskahiya mêrg û çîmenên Mêrgûmarê tarîtir û herdem şile dibiriqîn. Mijankên wê yên dirêj û serê wan bi jor ve tewiyayî, bi burhên wê yên ziravî tenik re li kêlekên dûr ên çavên wê, wiha ji hev dûr diketin ko ji ber xwe ve awirên wê tûj dikirin û vê yekê jî xweşikbûneke cudatir dida ser ruyê wê yê spehî û grover. Lêvên wê yên girs û lihevhatî, bêvila wê ya biçûk û hinarkên ruyê wê yên herdem gulpembeyî, bi çena wê ya biçûk û girover re wiha dibû yek ko wekî bi pênuşê mirov li gorî dilê xwe xêz bike, ji aliyê Yezdan ve hatibû resimandin.

Ji xwe dema hûçkên xeftanê xwe diavêt ser milê xwe û zendên wê heta enîşka wê derdiket holê, tenê wê yê wekî şîrê miyan spî û bêgirûz, wiha tenik bû ko ji rehên laşê wê, heta xwîna tê de digeriya û heta hestiyên wê dikirin ko diyar bibin. Her roj xeftaneke bi renekî li xwe dikir, lê bi mezinbûna pêsêrên wê û ziravbûna newqa wê kîjan xeftan li xwe bikraya dîsa her weke tayeke rihanê bû ko li hêviya bayê berbangê xwe bihejîne, wiha zirav, wiha tenik û wiha nazdar û dawetkar radiwestiya.

Ro, nû diket hijdeh saliya temenê xwe û êdî ji welatên derdorê yên dûrî du gol û du çeman zarokên wezîr, paşe, key û qralan bi barên diyariyan li ser piştta hêştir û hêstiran dihatin xwestina wê. Navê wê û xweşikbûna wê ji welatê Aceman heta welatê Samiyan û heta welatên li kêleka sê behran belav bibû. Roj nedima ko karwanek nedihat serdanê û Ro ji bavê wê nedixwestin. Qesr û qonaxa bavê wê her roj malovanî ji mêvanan re

dikir û ji goştê mirîşkan heta yê pez û xezalan, ji sênîyên birinc û savarê heta selikên fêkî û sewze, ji şerbikên şerbeta hinaran heta kaseyên ava sûsê, ji nanê tenûrê heta nanê sêlê tenê şîrê şêr ji ser sifreyan kê mî dima. Bavê Ro Padîşahekî wiha dilbirehm, wiha bêhnfireh û wiha mirovhez bû ko kî bihata ji bo xwestina keça wî bi yek dilgermî û dilnizmiyê ew pêşwazî dikirin û ti caran bersiva neyênî nedida wana û dilê wana ji xwe nedihîşt. Bi dilekî rehet û lêvkenî ji wana re digot:

— “Hûn ser seran û ser çavan hatine. We bi hatina xwe rûmet da me û em serbilind kirin. Bi dostanî û merivtiya we emê gelekî kêfxweş û dilşa bibin. Hûn dizanin ko li ser xaka welatê me herkes azad û wekhev dijî û kes nikare li ser vîna kesekî/ê bandûra xwe bike. Ji bo wê wa ye keça min û wa ye hûn. Keremkin pê re biaxivin ko ew bêje, ‘Erê’, ez ji doh ve razî me ko merivtiyê bi we re deynim û dostaniya we bidest bixim.”

Wê demê Padîşah ferman dida wezîrê xwe û bang li keça xwe dikir. Bêhneke din Ro bi hemû xeml û xweşîkbûna xwe diket hundir û silav li mêvanan dikir, derbasî kêleka bavê xwe dibû û destê xwe datanî ser destê wî, li cem radiwestiya. Bavê wê daxwaza mêvanan jê re digot û mêvan tev dilê wan dikir ko raweste, wiha bi baldarî li hêviya bersivdayîna wê radiwestiyan.

Ro bêhnekê di ber xwe de diponijî û pişt re bi lêvkeniyê ko baqê gul li ser ruyê wê veke û menqelek tije bizotên sor berde dilê mêvanan, dest bi bersivdayîna xwe dikir. Bi vebûna devê wê re rêzediranên wê yên wekî berfê spî û lihevhatî, di nava sorahiya lêvên wê re diterisîn û her peyva ji nava vê buhîştê derdiket wekî ji kitêbê bin bi baldarî û bi coş dihatin guhdarîkirin. Ro wekî bi vê sêhra peyvên xwe dizanîbû, peyvên xwe yek bi yek û bi hîlbijare derdixist derve û zêde dirêj nedikir, digot:

— “Bavo, mêvan hatine, ser serê min û ser çavên min hatine. Dikarin bi rojan û bi mehan li qesr û qonaxa me bibin mêvan û bixwin û vexwin û li

xêr û xweşiya xwe binêrin. Lê bila min biborînin ko niha ez biryara şûkirinê ji kesekî re nikarim bidim. Ez heta mîrê dilê xwe bi xwe nebînim, ez bersiva erênî nadim ti xwezgîniyan!”

Bi vî awahî kî dihat xwestina Ro destvala vedigeriya. Ro jî her roja derbas dibû ji ya din xweşiktir û spehîtir dibû û nav û dengê xweşikbûna wê jî bi rêka karwan û rêwingiyên zêdetir belavî cih û derên dûrtir dibû...

Li vî welatê di navbera du gol û du çeman de gavanekî wan hebû ko feqîr û rebenekî di halê xwe de bû. Sibehê radibû garan ji nava bajêr tev kom dikir, dida pêşya xwe û ew dibir nava mêrg û çîmenan diçêrand. Heta êvarî li her çar aliyê derdora bajêr digeriya û bi êvarî re berê garanê dida nava bajêr. Dawarên di garanê de wiha fêr bibûn ko her sibeh dema deriyê axoyan vedibûn bi xwe derdiketin û berê xwe didan ser rêka ji bajêr dertê, êvaran jî dema digihiştin nava bajêr, her yekî bi xwe rêka axoyê xwe digirt û ji gavên re qet zahmetî dernedixistin. Lê gavan jî qiymetê wana dizanîbû; ew yek bi yek dinasîn û simê yekî kul bibe bi saetan pê dadiket û heta rehet nekiriba dev jê bernedida.

Şênîyên wî welatî tev ji gavanê xwe razî û dilxweş bûn. Ji dawarên qesra Padîşah bigir heta yên herî feqîrê gund tev ga û çêlekên xwe,ker û hêstirên xwe, bi dilekî rehet dispartin wî û baweriya xwe pê dianîn. Ji ber ko gavan feqîr bû her yekî ji aliyê xwe ve alîkarî didayê; yê cil jê dihat cil dida, yê xwarin jê dihat xwarin dida û bi vî awahî ew jî bi xwe re didan jiyandin. Lêbelê dilê gel tev qasî ko jê razî bû, ewqasî jî pê dişewitî!

Jina gavên Sarê jî jineke di ciwaniya xwe de bi xweşikbûna xwe, bi nav û deng bû ko digotin gelek xortan ji bo ko Sarê pêşniyariya şûkirina bi wana re nepejirandiye, hilkişiyane ser Zinarê Sor ê xwediyê kevandeyeke qasî deh werîsan û ji wê derê laşê xwe avêtine xwarê, parçe parçe bûne. Sarê her ko mirina yekî ji wana bihîstiye, bi xwe çûye ser Zinarê Sor, li wê derê

rondik barandine û vegeyayê malê. Dawî rojekê dîsa ko ji ser Zinarê Sor vedigere, bi rê de li garana gund rast tê. Dibîne ko xortekî bejin navîn û spehî li ber garanê ye. Xort di ber re derbas dibe, lê awirên xwe nade ser wê û qet hayê xwe jê nayne. Di wê bêhnê de dilê Sarê dikeve wî gavanî û li dora garanê dizîvire, tê cem gavên, jê re dibêje:

— “Ev cara yekem e ko di vî welatî de xortek min dibîne û li min temaşe nake. Yan tu nemêr î, yan dilê te tarî bûye, yan jî hewaleke te heye! Divê tu ji min re bêjî ka çima te li min nenêrî?”

Feqîrê gavan çî bêje? Bala xwe dide Sarê; keçeke teze ya ciwan e ko keziyên wê yên ji qetranê reştir daketine ser ruyê wê yê ji berfê spîtir ko şerm dike ji xwe lê binêre. Çavên wê yên girsî zeytûnî wiha awirên tûj vedidan ko dema pê re rû bi rû dihat, dev û lêvên wî li hev herbilîn û nema dizanîbû çî bêje. Lê dawî bi kotekî be jî wêra xwe kom kiribû û gotibû:

— “Xwişka delal ez mirovekî feqîr û reben im. Tu dibînî ko gavanekî belengaz im. Tu keçeke bedewî halxweş î. Her roj ji bo te xort xwe dikin gorî. Tu li ko û ez li ku? Ez li te temaşe bikim wê çî bikeve destê min? Tenê wê dilê min bisoje û vala vala xwe biwestîne û biêşîne. Ji bo vê min li te nenêrî ko ji nêz ve bejn û bala te nebînim û dil bernedim te ko ez jî wekî wan xortan xwe di van lat û zinaran de neavêjim xwarê. Lê niha bi hatina xwe te rêka mirinê li ber min jî vekir.”

Bi vê gotinê rondik tije çavên Sarê dibin û destê xwe datîne ser destê Gavên û jê re dibêje:

— “Rabe garana xwe vegeyîne malê û ji dê û bavê xwe re bêje, bila îşev werin mala me û min ji te re bixwazin. Ez li vê derê bi vî ezmanî û bi vî Zinarî soz didim û sond dixwim ko ez bimrim ji axê re me, bimînim ji te re me.”

Bi vî awahî şûkirina Sarê û Gavanê wî welatî pêk tê. Salek, du sal, sê sal... deh sal derbas dibin lê Yezdan ti zarokan nade wana. Di welêt de ocaxek

namîne ko xwe navêjin bextê wê, bijîjkek namîne ko serî lê nadin, pîrejinek namîne ko pê naşêwirin, lê ti fêde ji ti derê nabînin. Dawî bi qedera xwe razî dibin û li hêviya rehma Yezdan dimînin ko rojekê li wana were rehmê û zarokê bide wana ko ew jî di nava hemwelatîyên xwe de serbilind bin û bê zuriyet ji vê dinyê neçin...

Di ketina sala yazdehan de Sarê bi xwe hisiya ko ducanî bûye... Destpêkê bawer nekir û got qey nexweşiyêke, yan ka tiştêkî din e. Lê dema zikê wê kêmekî mezin bû û lebitîn di laşê xwe de bihîst ji kêfan re kir ko bifire û veşare (sira) xwe ji mêrê xwe re vekir. Feqîrê gavan ji kêfan re nema dizanîbû çî bike! Bi vê kêfê derket derve û ghiştê kê mizgînî da wan ko jina wî ducanî bûye. Di wî welatî de jî kê ev agahî bihîst ji gavên zêdetir pê kêfxweş bû û bi sedan jin û keç hatin serdana Sarê û ew pîroz kirin.

Dawî neh meh û deh roj تمام bûn. Sarê bi xwe hisiya ko êdî wê bizê! Lê ber destê sibehê bû û tevahiya hemwelatîyan di xewa şêrîn de bûn. Ji bo vê ne dilê Sarê, ne jî yê Gavên negirt ko biçin cînarên xwe ji xewa şêrîn rakin û bînin alîkarîdayînê. Sarê di halê xwe de za; lê jê re ti zarok çênebûn. Li cihê zarokê zêbeşek anîbû dinyê. Zêbeşek ko ne deng jê dihat, ne his û ne kerrî...

Sarê di wî halî de dil şikestî bû û bi halê xwe giriya. Dilê xwe bi xwe şewitand û destê xwe bi ber Yezdan ve vekir û qêriya ko çî ji wana dixwaze. Lê gavan her di ber xwe de diponijî û dawî çû gel jina xwe, destê xwe danî ser serê wê û bi destê din Zêbeş girt û got:

— “Hurme, ger Yezdan li şûna kurekî Zêbeşek dabe me, helbet hikmetek di vî îşî de heye. Ka nede girî. Rondikên xwe nebarîne û dilê min nesojîne. Em zêbeş bixin bin kulînê, bila bimîne ka bê Yezdan çî dike, em bibînin. Ma wekî din em dikarin çî bikin?”

Sarê ji neçarî ev pêşniyara zilamê xwe pejirand û Zebeş avêtin bin kulînê. Dema bû sibeh cînarên hatin serdanê tev bihîstin ko jina gavên zaye û zebeşek aniye dinyê! Yê ev yek bihîstin li kerametên Yezdan şaş man û tev xemgîn bûn û bi dilekî kul vegeriyan mala xwe.

Rojek, du roj... deh roj di navberê re derbas bûn. Her roj bi çav pê dihisiyan ko zebeşê wana di halê xwe de mezin dibe. Di roja çelî de zebeş êdî têra xwe mezin bibû. Nîvê şevê ko Gavan û Sarê di xewa xwe ya şêrîn de bûn, bi carekê re Zebeş li halê xwe qelişî û xortekî ziravî dirêj ko ji rewş û xemla wî hundir wekî rojê ronî bû, derket holê...

Zebeşo ji binê kulînê derket û li ser kulavê li erdê rûnişt. Destê xwe dirêj kir û hingilîska di destê xwe de firkand û rawestiya. Bi firkandina hingilîskê wekî mijekê tije hundir bû û mij komîserhev bû, ji nava mijê efrîtekî cinan derket û li ber Zebeşo rawestiya û got:

— Mîrê min, keremke; ez ji te re dinyê xera bikim an ava bikim?

Zebeşo bersiv da û got:

— Ne xera bike û ne jî ava bike. Ez birçî me. Ka ji min re sifreyeke xwarinê amade bike û desteke cilên pak bîne ko ez li xwe bikim. Dayik û bavê min ko hişyar bibin, bila min di vî halê tazî de nebînin.

Di demeke qasî ko mirov çavê xwe bigre û veke de, Zebeşo dît ko sifreyek li ber amade ye, ji şîrê şêr heta nîvişk û hingivê hilandî her cureyê xwarinê li ser amade ye. Efrît fîstaneke ko tayên wê û nexşên wê ji zîv û zêr hatibû dirûtin jî di destê xwe de anîbû û danî ber. Piştî ko Zebeşo bi serê xwe jê re got ko dikare biçe, efrît dîsa bû pêleke mijê û ji ber çavan winda bû. Zebeşo fîstanê xwe li xwe kir û li ser sifrê rûnişt. Ji her xwarinê tamand û têt xwar.

Piştî xwarinê deng li dê û bavê xwe kir ko hişyar bibin. Gavan û jina xwe li ser denglêkirinê ji xewê hişyar bûn û çavê xwe vekirin. Bi vekirina çavên xwe jî mat man û dilê xwe bi xwe şewitandin ko mirine û çûne wê dinyê. Gavan û jina xwe wekî xweziya wan di qirika wan debimîne, wiha req mabûn. Sifreyek li erdê bû ko xwarinên di temenê xwe de qet navê wan jî nebihîstibûn, li ser rêzkirî bûn. Xortekî wiha çeleng û lihevhatî li ser sifrê rûniştibû ko mirov ji rewşa wî şerm fikir ji xwe re lê binêre û ji lînêrîna wî qet têr nedibû. Gelo ev kî bû û ji ko hatibû?

Zebeşo dema dît ko dayik û bavê wî mat mane, di nava lêvên xwe yên tenikî lihevhatî re beşişî û got:

— Qet mat nemînin û xwe netirsînin; ez kurê we me, Zebeşo me. Ko hûn bawer nakin, li binê kulînê binêrin, hûnê têbigihêjin rastiyê.

Berê xwe da kulînê û ji rewş û spehîbûna ruyê wî, kulîn tev di nava ronahiyê de ma. Dê û bavê wî zebeşê qeliştî û bûye di felqe dîtî û baweriya wana pê hat ko Yezdan dawî kurek daye wana.

Her du bi kelegirîya kêfxweşiyê xwe avêtin stuyê kurê xwe û ew maç kirin û bêhna wî kişandin hinava kezeba xwe. Bi salan e, bi hesreta kurekî bûn û dawî Yezdan kurekî wiha dabû wana ko li ser ruyê vê dinyê kur ji wî spehîtir, ji wî çalaktir, ji wî bedewtir ji dayik nebibûn.

Zebeşo, ew dawetî ser sifrê kirin û gavan û jina xwe ji kêfa kurê xwe re li ser sifrê rûniştin û ji xwarinên ko qet navê wan jî nebihîstine têr xwarin.

Berya bibe sibeh, Zebeşo ji dê û bavê xwe re got:

— Êdî divê ez vegerim cihê xwe. Heta ez negihêjim miradê dilê xwe divê însan min nebînin.

Bavê wî û dayika wî bi dilsojî gotin:

— Kurê min, delalê min, tu bes bêje ko miradê dilê te kî ye, em cilika binê xwe jî bifiroşin, emê biçin ji te re bixwazin û bînin malê.

Wê demê Zebeşo berê xwe da bavê xwe û got:

— Miradê dilê min keça Padîşahê vî welatî ye! Ger di vê dinyê de şabûneke min bi miradê min hebe, ji wê bêtir hemû qîz û jinên vî welatî xwişk û dayikên min bin. Hebe nebe ez Royê dixwazim û derveyî Royê ti miradê min nîne. Bavo, tu îroj dema bû sibeh rabe û biçe qesra Padîşah û keça wî Ro ji min re bixwaze.

Gavan, di dilê xwe de got; ‘Na, na! Ez hîn di xew de me û xewnan dibînim. Ez hişyar nebûme! Yan ez mirime û çûme wê dinyê û bi ferîşteyan re diaxivim, yan jî ez di xewê de me û xewneke ecêb dibînim. Ma ez dîn bûme ko biçim bi vî halê xwe yê gavantiyê keça Padîşah bixwazim?’

Dayika wî û bavê wî li ber geriyan ko dev ji vê miradê berde û di vî welatî de wekî din kîjan keçê dixwaze bi soz û peyman wê biçin jê re bixwazin. Lê Zebeşo bi biryar bû û bi vebirî axift û got:

— Bavo, ez ji te re dibêjim, biçe ji min re keça Padîşah bixwaze, tu qala keçên din dikî! Dema bû sibeh rabe ser xwe û biçe qesrê, derkeve huzûra Padîşah û keça wî bixwaze û Padîşah ji bo qelenê keça xwe çî bixwaze jî nebêje na!

Gavan û jina xwe kirin û nekirin nikarîbûn kurê xwe qanî bikin. Zebeşo gotina xwe got û ket bin kulîne. Her du qalikên zebeşan li xwe pêçan û di nava wan de nediyar bû. Gavan û jina xwe li hev rûniştin û ponijîn bê ka dikarin çî bikin. Dawî jina wî got:

— Heyra ev deh sal in em li hêviya zarokekî bûn ko Yezdan kurekî bide me, em jî di nava gel de ji rûreşiyê xelas bibin. Dawî Yezdan bergerên me pejirandin û kurek da me. Bi roka ko her sibeh dertê û her êvar diçe ava hikmetek di vî zarokî de heye. Ma te nedît bê çî sifre raxistibû û çî fîstan li xwe kiribû? Ka rabe biçe qesr û qonaxa Padîşah, dibe ko xêrek di vî karî de hebe!

Gavan bi hiş û aqilê jina xwe keniya û got:

— Hurme, sitiya delal, ma tu jî dîn bûyî, ma te jî hiş û aqilê xwe xwariyî? Ezê çawa rabim û biçim qesr û qonaxa Padîşah? Hîn ez negihiştme ber derî wê leşker û zêrevanên wî bi çepilên min bigrin û min biavêjin derve, nahêlin ez siya Padîşah jî bibînim.

Jina wî dîsa li ber geriya û got:

— Ger tu neçî, wê kurê me bixeyide û dibe ko careke din ji hundirê zebeşê xwe dernekeve. Serê deh salan Yezdan li me hatiye rehmê û kurek daye me, ma emê çawa dilê wî bihêlin? Ka tu biçe û carekê xwe biceribîne. Qey te nakujin ko tu wiha xwe ditirsînî?!

Rebenê gavan ji neçarî pejirand û bi berbangê re derket derve. Garan ji nava bajêr kom kir û berê wê da mêrg û çîmenên li derveyî sûr û bedenên bajêr û vegeriya, berê xwe da qesr û qonaxa Padîşah.

Qesrû qonaxa Padîşah lê dima, li serê girekî ko bi dest hatibû bilindkirin ava kiribûn. Di nîvê bajêr de û di ser tevahiya mal û qesran re bû. Ji bo mirov bigihiştê deriyê qesrê yê ji sifir û tûncê çêkirî, pêwîst bû çel pêlikî bi jorê biketa. Piştî hilkişandina çel pêlikan mirov digihişt meydanake fireh ko ev meydan weke rêyeke fireh li derdora qesrê dizivirî. Dema mirov meydan derbas dikir, dihat ber derî û li ber derî herdem leşker û zêrevanên Padîşah nobet digirtin.

Gavan di pêlikan re bi kabên lerizî û laşê ricifokî hilkişiya û di ber xwe de digot: ‘Ez kî, dîtina Padîşah kî û xwestina keça Padîşah kî? Haydê em bêjin dilê nobedaran bi min şewitî û ez derbasî hundir kirim, wê Padîşah çawa min bipejirîne huzûra xwe, haydê em bêjin dilê wî jî bi min şewitî û ez derketim huzûra wî, wê zimanê min çawa bigere ko ez keça wî bixwazim. Ma wê kenê xwe bi min neke? Haydê em bêjin dayîna keça xwe pejirand, wê demê ezê qelenê keça Padîşah ji ko bînim? Na, na! Qedera min tamam bûye û berê min ketiye ser mirinê!’

Gavan bi van hestan car caran lingên wî ew paş de dibirin û bi hêza gotinên jina xwe dîsa bi pêş de dimeşiya. Dawî ghişt meydana li ber deriyê qesrê. Dema ji nêz ve çav li nobedaran ket û rim û mertalên di destê wana de dît, kabên wî yekcarê sist bûn û li wê derê qûn da erdê. Bû nîvroj, bû esir hîn ji cihê xwe nerabibû û nediwêrî biçe ber derî ko destûra derbasbûna hundirê qesrê bixwaze.

Nobedarên li ber derî jî ew ferq kiribûn û di nava xwe de gengeşe kiribûn ko ka ev kesê feqîr û reben gelo ji ber çi hatiye û li pêşberî derî rûniştiye? Di rastiye de her roj ji nava bajêr kesên feqîr, jinebî, kalên bêkes, kor û kulekên bajêr û sêwî dihatin ber derî û ji nobedaran dixwestin ko Padîşah li wana were rehmê û hinek qût bide wana. Padîşahê wî welatî ji ber ko yekî dilbirehm bû, ferman dabû nobedarên xwe ko kî were ber deriyê wî wana vala venegerînin û ji kawarên qût çi pêdiviya wana hebe, bidin wana. Ji ber vê yekê nobedarên ji sibehê ve çavên wana li ser gavanê rûniştî, di nava xwe de gengeşe kirin û gotin ko sedî sed ev mirov hatiye qût bixwaze, lê ka bê şerm dike, ka dilê wî rê nade, ka ji ber çi ye, nayê, naxwaze. Ji bo vê di nava xwe de biryar dan ko hinek qût amade bikin û bidinê. Dawî nobedaran ji kawarên Padîşah qûtê malekê anîn û bang li gavanê kirin ko were bibe. Gavan dema nobedaran bang lê kirin, ji tirsan re kir ko dilê wî were ber devê wî û ji xwe re got; 'Aha, niha wê min bigrin û biavêjin binê zîndanê!'

Dema nobedaran qût şanî wî dan û gotin ko dikare bibe malê ji kulfetê xwe re, dilê wî hinekî rehet bû û dengê xwe nekir. Rahîşt tûrê qût û berê xwe da derveyî bajêr. Garan da ber xwe û hat malê.

Dema bû êvar, Zebeşê di bin kulînê de dîsa qelişî û xortê malê ji navê derket, rewş û xemla wî hundir qasî nivê rojê ronahî kir. Zebeşo hat gel dê û bavê xwe û ji bavê xwe pirs kir ko îroj çi kiriye. Dema bihîst ko bavê

wî derbasî qesrê nebûye û bi tûreke qût vegeriyaye, bi ser bavê xwe de hilbû û got:

— Bavo, ma qey tu hewceyî qûtê Padîşah î? Ez ji te re dibêjim biçe keça Padîşah bixwaze, tu diçî ji destê nobedaran tûrê qût digrî. Va ye ez ji te re dibêjim; tê sibe rabî, biçî qesrê, derkevî dîwana Padîşah û tê keça wî ji min re bixwazî!

Zebeşo gotina xwe bi dawî kir û bi lez vegeriya bin kulînê û di navbera qalikên xwe de winda bû. Jina gavên bi ser de rabû û got:

— Min ji te re negot tê kurê me bixeyidînî? Wa ye çû û dîsa ket nava qalikên xwe. Ji sibehê ve hesreta min bû ko ez wî bibînim û destê xwe di ser serê wî re bibim. Lê te nehişt. Tu çûba huzûra Padîşah û te jê re gotiba, ma wê te bixwara, ma wê te bikuşt? Yan wê bigota erê, yan wê bigota na û tê bihatayî!

Gavan keserek veda û got:

— Hurme, sitiya delal; qe ne tu wiha nebêje. Ma we hiş û aqilê xwe xwariyî? Li ko derê hatiye dîtin ko gavanek çûye keça Padîşahekî xwestiye? Qey hûn dixwazin serê min jê veke û bi ber deriyê qesrê veke? Lê jina gavên ji ser a xwe daneket û ji mêrê xwe xwest ko sibehê cardin biçe qesra Padîşah.

Gavan bi rastî mirovekî reben û belengaz bû; him ji Padîşah ditirsiya û him jî nedixwest aramiya mala wî û ya di navbera wî û jina wî de xera bibe. Heta sibehê bi dilekî kul bi vî milî û wî milî de xwe qulipand û li ser paşiya xwe ya ko wê di zindanê de yan jî di gorê de bi dawî bibe ramana xwe westand. Dema dîkê sibehê bang da ji nava nivînan derket û careke din garana xwe berda ser mêrgê û hilkişiya meydana pêşberî deriyê qesra Padîşah.

Lê dema gîhişt meydanê dîsa kabên wî sist bûn û li pêşberî derî qûn da erdê û rûnişt. Nobedaran dîsa bala xwe dan ser û di navbera xwe de

gengeşe kirin ko çi hewala vî zilamî heye. Dawî ji nava xwe yek derxistin ko jê bipirse ka çi dixwaze. Nobedarek hat gel gavan û jê pirs kir bê çi derdê wî heye, ev du roj in tê li ber vî derî rûdinê.

Gavan bi dengê lerizî got:

— Ez hatime ko derkevîm dîwana Padîşah û keça wî ji kurê xwe re bixwazim.

Dema wiha got, yê nobedar pê kenîya û ji kenan re kir ko zikûpişt li erdê dirêj bibe. Li ser kenê wî yê qebe hevalên wî yên nobedar hatin û pirs kirin ko çi diqewime? Nobedar xwesteka gavan ji wana re got û tev bi hev re pê kenîyan. Dawî yekî ji wana bi ser gavan de rabû û got:

— Li halê xwe binêre û ji xwe şerm bike! Ger ji Yezdan netirsiyabama, niha minê serê te ji laşê te vekiriba û bi serê rima xwe ve daliqandiba! Pişt re nobedar lingê xwe bilid kir û heta jê hat, pehînek li sînga gavên da û ew di pêlikan re gêrî xwarê kir.

Gavan di her çel pêlikan re gindirî xwarê û hestû û parsuyên wî tev hûr hûr bûn. Bêhnekê li binê pêlikan wiha bê hiş ma. Dawî bi kotekî bi ser hişê xwe hat û rabû ser xwe. Bi rewşeke pir xerab, bi zorê xwe gihand malê û avêt nava nivînan û ji jina xwe re got ko halê wî nîne garanê bîne, divê ew biçê bîne.

Jina gavên derket derve û çû garan anî bajêr. Êvarî dema tarî ket erdê, zebeşê di binê kulînê de careke din qelişî û kurê wana derket derve, dîsa hundir wekî nîvro ronahî bû. Zebeşo ji bavê xwe pirsî ko keça Padîşah xwestiye yan na?

Bavê wî bi nalîneke ji kûrahiya dilê xwe bersiv da û got:

— Çi xwestina keça Padîşah û çi hal? Nehiştin ez xwe nêzî deriyê qesrê bikim. Nobedar bi min kenîyan, tevezên xwe bi min kirin û yekî ji wana pehîna xwe li ser sînga min da û min di çel pêlikên hildikşin meydana ber deriyê qesrê re gindirand xwarê. Yek hestiyê min ê bi hev ve saxlem

nema. Her derê laşê min pelixî. Dev ji vê evînê berde, ma di vî welatî de qey keç qeliyane ko tu keça Padîşah dixwazî? Derveyî wê tu tiliya xwe bi ber kîjan keçê vekî soz û peyman li min be ko ez bînim bixim paşila te, bes careke din min rênêke ber deriyê Padîşah!

Lê Zebeşo bi biryar bû û ji ser a xwe daneket xwarê. Careke din xwe bi bavê xwe de aciz kir û got:

— Bavo, ez ji te re dibêjim biçe keça Padîşah bixwaze, tu diçî lêdanê dixwî û tê. Heyf mixabin ko tu bavê min î! Ez ji te re dibêjim biçe, derkeve huzûra Padîşah û keça wî Ro ji min re bixwaze!

Zebeşo gotina xwe got şûn re careke den vegeriya bin kulînê û ket nava qalikên xwe û nediyar bû. Gavan û jina xwe dîsa ketin qirika hev û jina gavan got:

— Pepûko, newêreko; ji xwe dema min li ser rêka Zinarê Sor te li ber garanê dît min jî got qey tu mêr î û zilamekî çeleng î! Ma min zanîbaya tu ev nemêr î, min dil berdida te û digot were min ji bavê min bixwaze? Qey tu nizanî evîndarî û dilketin çi ye? Kurik dibêje dilê min ketiye Royê, tu dibêjî, ‘tiliya xwe bi ber yeke din veke!’ Sibehê tê rabî û derkevî dîwana Padîşah û tê keça wî ji kurê min re bixwazî! Ger tu nexwazî, êvarî neyê malê û careke din nekeve nava nivînên min û sînga xwe bi sînga min germ neke!

Gavan her çiqasî li ber xwe da, dît ko bêfêde ye. Sarê qet guh jî lê nekir. Lihêfek avêt ser mêrê xwe yê hestiyên wî tev dijenin û cara yekem çû ser nivîneke din xew kir. Cara yekem gavan di nava nivînên xwe de bi tena serê xwe ma. Bi dilekî tije kul û keder û bi laşekî pelixî û hestî û parsuyên şikestî heta sibehê naliya û qet dilopek tenê jî xew -ji dermanan re be jî, neket çavên wî. Di dilê xwe de digot; ‘Vê carê ko ez biçim, sedî sed wê min bikujin!’

Dema bû sibeh û dîkên berbangê awaza xwe bilind kirin, Sarê deng li mêrê xwe kir, gezek nan da ber û piştî xwarinê ew di derî re derxist û berê wî da qesr û qonaxa Padîşah. Ew bi xwe jî derket nava bajêr û garan da ber xwe, berê garanê da derve, bir ser mêrg û çîmeneke têr şînahî û vegeriya malê.

Gavan bi nale nala jana laşê xwe û bi waswasa dilê xwe ket ser rêka qesra Padîşah. Bi kotekî her çel pêlik derbas kirin û bi bêhneke çikiyayî li ser berê ko her roj qûn datanî ser rûnişt û awirên xwe dirêjî deriyê qesrê û ser nobedaran kir.

Nobedarên ew dîtin di cih de kenyan û hatin gel, tevezên xwe pê kirin û gotin:

— Va ye xwezgîniyê sitiya Ro hatiye. Ka jê re rê vekin, wê Padîşah were huzûra wî û keça xwe bideyê!

Bêhnekê tevezê xwe pê kirin şûn re ew nobedarê cara din dîsa pehînek li sînga wî da û ew di pêlikan re gêrî xwarê kir. Gavan di her çel pêlikan re gindirî xwarê û hestiyên ko cara din saxlem filitîbûn jî vê carê tev şikiyan û bê hiş û bê ruh li wê erdê dirêj bû.

Kesên di wir re derbas bûn û ew naskirin, lê hatin rehmê û ew ji erdê rakirin. Ketin bin milê wî û ew bi kotekî gihandin malê. Ji cînanan bang li yekî cebar kirin ko bê hestiyên wî yên şikestî bicebirîne.

Êvarî dema cînar çûn malên xwe û reşahî ket erdê careke din zebeşê di bin kulînê de qelişî û kurê malê derket derve. Careke din ji rewşa wî hundir ronahî bû û dayika wî kêfxweş bû, lê bavê wî di dilê xwe de got; 'Wê dîsa berê min bide qesra Padîşah û vê carê sedî sed ezê biçim goristanê!'

Bi rastî jî wiha bû. Zebeşo dema bihîst ko bavê wî dîsa keça Padîşah nexwestiye hêrs bû û got:

— Pêwîst e tu sibehê rabî û dîsa berê xwe bidî qesrê û ji min re keça Padîşah bixwazî.

Gotina xwe qedand û dîsa vegeriya bin kulînê û di navbera qalikên xwe de ji ber çavan winda bû. Careke din Sarê bi ser gavan de rabû û ew bi tirsonekî, newêrekî û bêkêrî tawanbar kir û dîsa nivînên wî ji yên xwe cuda kir. Gavan wê şevê jî heta sibehê bi jana laşê xwe bi nale nala ji êşa hestiyên şikestî dertê, bi vî milî û wî milî de qulipî û yek dilop tenê jî xew neket çavên wî. Dema dîkê berbangê dengê xwe bilind kir jî Sarê ew ji nava nivînan kişand, gezeke nan da ber û ew di derî re derxist, berê wî da qesra Padîşah.

Gavanê reben ji neçarî careke din berê xwe da qesra Padîşah. Heta her çel pêlik hilkişiya, ji xwe hal tê de nema û bi kotekî li wê derê qûn da erdê. Nobedarên ew dîtin, dîsa hatin gel û tevezên xwe pê kirin û jê pirs kirin ko vê carê ji bo çi hatiye? Gavan careke din diyar kir ko hatiye derkeve dîwana Padîşah û keça wî ji kurê xwe re bixwaze! Nobedar tev pê keniyên û li halê wî nêrîn ko vê carê jî wî di pêlikan re gêrî xwarê bikin sedî sed wê bimre û qetla wî bikeve situyê wana! Yekî ji wana got:

— Wê ev zîlam di destê me de bimre û ger Padîşah pê bihise wê serê me jê veke! Ya baş em agahiyê bidin wezîr û bila ew jî ji Padîşah re bêje ko hal û ehwalê vî zîlamî wiha ye. Êdî ew çi dike, ew dizane. Ger em wiha nekin wê ev zîlam di destê me de bimre, êdî em nikarin ji ber gunehê wî xwe xelas bikin!

Li ser vê yekê agahî gihandin wezîr û jê re ta bi derziyê vekirin; ji roja yekem ve çi bi serê zîlam kirine tev gotin.

Ji ber ko Padîşah mirovekî dil bi rehm bû û dixwest li welatê wî dilê kesekî jê nemîne, ferman dabû wezîrê xwe ko ji ser xaka welatê wî kî çi derdê wî hebe û bixwaze bigihêne Padîşah, divê sedî sed agahiya wî jê were çêkirin û ji bo vê jî wezîrê xwe erkdar kiribû. Li ser vê yekê wezîr ferman

da nobedaran ko gavên bînin huzûra wî. Gavan derbasî hundirê qesrê bû û çavên wî ji hev veciniqî man. Cara yekem bû hundirê qesra Padîşah didît. Ji baxçeyên gul û kulîlkan ên teyrên tawus di navê de digerin, ji birkên tije avên spehî ko qaz û werdek tê de avjenî dikin, ji qesefên teyr û tilûrên bi her awazî distirên bigir heta avahiyên bi kevirên şehkirî hatine lêkirin û bi xizmetkarên xemilandî her tişt û her kes jê re xerîb hat.

Wezîr li ser pêlikên qesrê ko tev ji mermerên spî hatibûn lêkirin ew pêşwazî kir û bi hev re derbasî salona qesrê bûn. Li wê derê ew li ser kulav û xaliyên neqîşandî da rûniştin û heta ko cariyeyên weke karên xezalan tasên dewê cemidî anîn û vexwarin qet dengê xwe nekir. Piştî ko dew vexwarin, Wezîr pirs kir ko sedema hatina wî û xwesteka dîtina Padîşahê welêt çi ye?

Gavan ji xwe hîn di nava wê tirsê de bû ko wê wezîr niha bang li çend celadên xwe bike û wî bibin selexanê û serê wî ji laşê wî vekin. Ji bo wê çi bi serê wî hat û kurê wî çi jê xwest tev ji wezîr re ta bi derziyê vekir û vegot.

Wezîr piştî ko guhdarî li gavên kir serê xwe hejand her du aliyan û destûr xwest derket derve. Gavan di dilê xwe de got, 'Êdî malik li min xera bû; wa ye diçe bang li leşkerên xwe bike û min bide destê celadan!'

Neptî wezîr vegeriya û jê re got:

— Rabe, bide pey min, tê derkevî dîwana Padîşah!

Gavan bi rastî bawer nedikir ko wî bibin dîwana Padîşah. Di alûleyên(korîdor) dirêj û fireh re derbas bûn. Ode û salonên mezin ên deriyên wan ji darên gozan hatine çêkirin borandin û gihiştin ber deriyekî mezinî bilind ko wekî zêr diterisand û li her du aliyên wê nobedarên rim û mertal di dest de radiwestiyan. Bi destûrdayîna nobedaran, di derî re derbas bûn û ketin saloneke ko heta vê gavê salonên wiha dirêj û fireh nedîtibû. Erda salonê tev bi xaliyan raxistî bû û li her derê findên mezin

pêxistî bûn. Li kêleka rê destpêkê li xizmetkar, cariyê û qerfokan rast hatin. Ew derbas kirin şûn re bi zanyar, mamoste û bijîjkan re rû bi rû hatin; pey wan re li çend rîspiyan qelibîn û çavê wî bi carekê re li Padîşahê di nava xeftanê neqîşandî de, li ser textê xwe rûniştîye ket! Ewqasî şaş mabû ko nema dizanîbû çî bêje û jibîr kiribû bê bi çî sedemê hatiye vê derê.

Bi rawestina wezîr re hat bîra wî ko divê ew jî raweste. Wezîr silav da Padîşah, gavan da nasîn û xwe da kêlekê. Gavan û Padîşah man li pêşberî hevûdu. Padîşah bi dengê bilindî fermankar deng li gavên kir ko xwe bide nasîn û daxwaza xwe bîne ser ziman.

Gavan careke din dest bi vegotina serpêhatiya xwe û xwesteka kurê xwe kir û got:

— Ger ez destvala vegerim malê wê kurê min dîsa min rêbîke vê derê û bixwaze qîza te bixwazim.

Li ser vê gotinê di serî de wezîr û hemû rîspî, zanyar, mamoste, bijîjk, tev di ber xwe de beşîşîn. Lê qet xêzkên ruyê Padîşah nelivîyan û tevza xwe bi gavên nekir. Hinekî di ber xwe de ponijî û pişt re vegehiya ser wezîrê xwe û ferman dayê ko bang li keça wî Royê bikin. Wezîr derket derve û Padîşah zîvirî ser Gavên û got:

— Tu gavanê bajarê min î; bi salan e tu diçî ber dawarên vî welatî û di sar û seqemê de, di havîn û zivistanê de tu dawaran bi xwedî dikî û ji gur û neyaran diparêzî. Ji bo vê qiymeta te li gel min heye û ezê vê qiymeta te bigrim, xwesteka te neşikînim. Çawa ko mêvanek ji welatekî dûr tê û dibe xwezgînî û keça min dixwaze, ezê te jî wekî yekî ji wana bigrim dest û çawa nêzî wana dibim, ezê wiha nêzî te jî bibim. Bila keça min were hundir û ezê jê bipirsim ko ew bi vîna xwe bipejirîne bi kurê te re şû bike, soz û peyman ji te re ko keça min bibe bûka mala te.

Gavan bi vê gotinê ewqasî kêfxweş bû ko xwe avêt destê Padîşah û xwest ramûsîne. Lê Padîşah rê nedayê û ji xwe di wê bêhnê de wezîr û keça Padîşah Ro jî ketin hundirê salonê. Dema Ro di deriyê salonê de diyar bû, herkesê li hundir bêhna xwe girtin û awirên xwe zîvirandin ser wê ko ji xwe re li xeml û rewşa wê binêrin û bigihêjin tama dîtina xweşikbûna wê. Gavan cara yekem bû xweşikbûneke wiha li ser bejn û bala mirovekê didît. Ro ewqasî xweşik bû ko Gavan li hember xweşikbûna wê da şermê û ji ber hatina gel Padîşah û xwestina wê ya ji kurê xwe re, di dilê xwe de bi xwe de xeyidî! Lê dilekî wî jî di guhê wî de pispisand ko di rastiye de ji spehîbûn û çelengiya kurê wî re, tenê keçeke wiha dikare bibe yar û evîn. Ro di seranseriya salonê re derbas bû û hat li kêleka bavê xwe li ser xaliya neqîşandî rûnişt. Destê xwe danî ser destê bavê xwe û awirên xwe dirêjî rewş û bala gavên kir. Gavan di bin awirên wê yên tûj û biriqandî de hindik ma ko erdê biqelişîne û xwe tê de winda bike. Lê axaftina Padîşah ew ji vê şermê xelas kir û Padîşah ji keça xwe re got ko gavan hatiye wê ji kurê xwe re dixwaze, ka bê bi dilê wê ye, yan na!

Ro keçeke jîr û xwende bû. Her roj zanyarek ji zanyarên herî xurt ên welêt dihat ba û di warê felsefe, zanistî, bîrkarî, wênegerî, mûzîk û hwd. de ew fêr dikir. Ji bo wê Ro yekser bersiva gavan neda û bêhnê di ber xwe de ponijî, pişt re devê xwe dirêjî guhê bavê xwe kir û di guhê wî de kir pistepist. Bi vê pistepistê re xêzkên ruyê Padîşah sist bûn û lêvkeniyek li ser ruyê wî diyar bû. Ew lêvkenî li ser ruyê Ro jî diyar bibû û wekî baqeke gul li ser ruyê wê vebin wiha lê xweş hatibû. Dawî Padîşah zîvirî ser Gavên û got:

Ezê biryara keça xwe ji te re bêjim. Keça min şûkirina bi kurê te re bi şertekî dipejirîne. Ger tu vî şertî heta sibehê dîkê berbangê bang bide pêk bînî, tu dikarî werî keça min biguhêzî. Na ko tu pêk neynî ezê te bidim destê celadan û wê serê te ji laşê te vekin. Tu vî şertî dipejirînî yan na?

Gavan dizanîbû ko çî şert were pêşya wî ew hêza wî tinebû bi cih bîne! Mînak ko Padîşah gotiba, ‘tê hezar zêrî qelen bidî’, gavanê reben xwe derxistiba sûkê û firotiba, belkî du zêr jî nekiribaya. Wê çawa bikarîba şertên Padîşah û keça wî pêk bianiya? Lê carekê tîr ji kevên firiyabû û êdî nema dikarîbû ji gotina xwe vegere. Ji xwe heta dîwana Padîşah hatibû û ko li vê derê ji gotina xwe vegeyiriba jî, wê serî hatiba jêvekirin, şertên wî bipejirandiba jî wê serî hatiba jêkirin. Di dilê xwe de got, ‘Qe ne ez bipejirînim ko heta sibehê temenê xwe dirêj bikim. Ger ez nepejirînim, wê vê gavê min bide destê celadan û ez careke din ruyê malê nabînim’. Dawî diyar kir ko ew şertê Padîşah dipejirîne. Li ser vê yekê Padîşah bang li nivîsvanên (katibên) xwe kir ko tiştê dibêje yek bi yek binivîsînin. Nivîsvan hatin û rûpelên xwe yên ji çermên xezalan li erdê raxistin û pênuşa xwe girtin dest xwe. Padîşah şertê xwe li pey hev rêz kir û got: — Tu vê qesra min dibînî! Niha wê wezîr bi destê te bigire û te li tevahiya odeyan bigerîne. Her tiştê di vê qesrê de tev li xizmetkar û cariyeyan, tev li gul û kulîlkan, tev li xalî û kulavan, tev li find û feneran, ji xemla deriyan bigre heta ya dîwaran, ji neqşên li ser sitûnan bigir heta yên bin zikê banan, çî li ber çavê te bikeve ji bîr neke û di hişê xwe de bigre. Ji ber ko divê heta sibehê dîkê berbangê bang bide tu li hemberî qesra min qesreke wekî vê mezin, fireh û raxistî ava bikî. Divê ji qesra tu ava bikî rêyeke ji xaliyan raxistî dirêjî qesra min bibe û li her du aliyên rêkê xizmetkar û cariyeyan ji ber qesra te heta qesra min rêz bibin. Dema te ev pêk anîn bi berbangê re çel hêstirên têrên wana aliyek tije zîv, aliyek tije zêr amade bike û bi xwezginiyan re berê xwe bide qesra min. Dema ko ez bi bangdana dîkê sibê re derketim ser şanîşeya qesrê û min qesra te dît û çavê min li hatina karwanê hêstiran û xwezginiyan ket, ezê jî fermanê bidim cariyeyan ko keça min Ro ji kurê te re bixemilînin û derxînin ser rê. Lê dema bû sibeh û ez van tiştan nebînim, zanibe ko wê celad werin ber

deriyê te, serê te ji laşê te vekin û li derxaneyê bajêr bi dar dakin ko ji herkesê re bibe îbret!

Rebenê gavan çî bêje û çî bike? Serê xwe daqûlî ber xwe kir û bi rewşeke qidûmşikestî da pey wezîr ko li salon û odeyan bigere. Lê di rastiyê de çavên wî tiştê nedidît û di ber xwe de digot: ‘Te xwar, kero? De bixwe! Çî ji te re lazim e, tu werî keça Padîşah bixwazî? De ka, heta sibehê tu xwe hilavêjî jî, ne qesreke wekî vê tu nikarî kevirekî wê yî şehkirî çêbikî. Ya baş vegere malka xwe, rahêje tevr û bêra xwe û ji xwe re gora xwe bikole ko laşê te yê serjêkirî li erdê nemîne!’

Piştî geryana qesrê, Gavanê reben bi dil û qidûmekî şikestî, bi hêviyê qediya yî û bi kabên sist hat malê û rasterast xwe avêt nava nivînan. Jina wî hat gel û pirs kir bê îroj çî kiriye? Gavan bi kotekî bersiv da, şertê Padîşah û keça wî dane ber vegot û wiha got:

— Êdî hûn ghiştin miradê xwe, we mirina min bi destê min anî. Sibehê bi berbangê re wê celadên Padîşah werin û serê min ji laşê min vekin.

Jina gavên bi vê agahiyê pir xemgîn bû, lê xwe weke mêrê xwe bêhêvî nekir. Di dilê xwe de got, ‘Ka bila bibe êvar û zebeşkê min ji qalikê xwe derkeve, bê Yezdan çî rêkê dide ber me wê diyar bibe!’ û pişt re derket derve û berê xwe da mêrgê ko dawaran vegevine bajêr.

Dema bû êvar, Sarê garan anî û li nava bajêr belav kir şûn re hat malê. Bi ketina tarîtiya ser êvarê re jî çavên wê li bin kulînê, li hêviya qelişîna zebeş û derketina kurê xwe ma. Neptî wekî hêvî dikir, zebeş qelişî û kurê wê bi hemû rewş û xemla xwe derket derve û hundir dîsa wekî nivê rojê ronahî bû.

Zebeşo ji bavê xwe pirs kir ko îroj çî kiriye? Gavan çawa çûye qesrê, çawa dilê nobedaran pê şewitiye, çawa ew birine huzûra wezîr, çawa wezîr lê guhdarî kiriye, çawa agahî daye Padîşah, çawa derketiye dîwana Padîşah, çawa Padîşah guh daye ser daxwaza wî û çawa bang li keça xwe kiriye,

keça wî çawa hatiye hundir û çiqasî xweşik e û pişt re keçikê çawa di guhê bavê xwe de kiriye pistepist û pê re çawa şert daniye ber wî û ew û wezîr çawa li qesr û qonaxê geriyane tev ta bi derziyê vekir û ji kurê xwe re lib bi lib vegot.

Piştî vegotina wî bi dawî bû vegeriya ser kurê xwe û got:

— Ev deh sal bûn min ji yezdan zarokek dixwest. Yezdan dawî bergera min pejirand û kurek da min, lê li hemberî vê diyar e giyana min dixwaze. Heqê xwe li min helal bikin, ji ber ko ez ti caran nikarim vî şertê Padîşah û keça wî bi cih bînim û wê sibehê celadên wî werin û serê min ji laşê min vekin, bibin li derxaneya bajêr bi dar dakin.

Zebeşo bi baldariyeke mezin guh dabû ser vegotina bavê xwe û heta dawî qet dengê xwe dernexistibû. Dayika wî şîveke ji sawara bi rûn a pîvaza xwêkirî li ber danîbû û bi çavên berger li hêviyê bû ko bixwe. Piştî bidawîbûna vegotina bavê wî, Zebeşo, ji cihê xwe liviya û dest bi axaftinê kir û got:

— Yadê, yabo; hûn qet mereq nekin; min jî digot qey ka bê Padîşah wê tiştêkî li ser ruyê vê dinyê tinebe bixwaze! Malê dinyê ne tiştêk e! Ka em xwarina xwe bixwin û hûn ji xwe re bi dilekî rehet razên. Heta sibehê sed dinya xera dibe û sed dinya ava dibe. Hezar derî tên girtin û hezar deriyên din vedibin. Di vê dinyê de tiştêk nîne ko neyê pêkanîn. Hêviya xwe ti caran qut nekin. Di her rewşa tengezar de jî dîsa hêvî divê herdem hebe! Vê carê kurê malê neçû bin kulînê û xwe di nava qalikên xwe de veneşart. Bi dê û bavê xwe re xwarin xwar û bi wana re sihbet û gengeşe kir. Sarê ji vê rewşê ewqasî dilşad bû ko dikir bask pê ve şîn werin û bifire ber perê ezmanan. Lê rebenê gavan hîn di fikara bûyîna sibehê û hatina celadan de bû. Di vê dilwaswasiyê de, serê xwe danî ser balgîfê û di xew re çû. Bêhneke din Sarê jî çavên xwe li xewê girtin û kurê wan bi tena serê xwe ma...

Derdora nîvê şevê kurê malê gustîlka xwe derxist û firmand. Mijêke gewr tije hundirê malê bû û neptî efrîtekî cinan li pêşberî Zebeşo rawestiya ko lêveke wî li erdê, lêveke wî li ezmanan bû. Destê xwe li ber xwe gihandin hev û got:

— Ferman bike mîrê min, ez ji te re dinyê xera bikim an ava bikim?

Kurê malê got:

— Ne dinyê xera bike ne jî ava bike; bes guh bide gotina min. Niha tê rabî û biçî li tevahiya qesr û qonaxa Padîşah bigerî û çî tê de ye, çî ne tê de ye tevî bibînî; ji hespên di axoyan de heta teyrên tawis ên di nava baxçeyan de; ji neqşên li ser sitûnan heta fîstanên cariyeyan; çî li wê derê hebe baş binase û pişt re li qesrê binêre ka çend ode, çend salon û çend nêrdewan lê hene. Heta nebûye sibeh dixwazim tu qesreke wekî qesra Padîşah û qonaxên wekî yên wî tê de li hemberî qesr û qonaxa wî ava bikî. Divê ev qesr û qonax mû ji ya Padîşah bernede. Ji qesra tu çêbikî heta qesra Padîşah divê tu rêyekê çêbikî û bi xaliyan raxînî. Li her du aliyên rêkê cariyê û xulam ji vir heta wir rêz bibin û çel hêstirên têrên wan aliyek zêr aliyek zîv bi rê bixî û ji dayik û bavê min re jî cilên pak û neqîşandî bînî ko sibehê biçin keça Padîşah biguhezînin. Ji xwe hacet nîne ez qala xwarin û vexwarinê bikim ko tu amade bikî; wan tiştan jî êdî tu bi xwe bifikire. Qesra min a ko tu çêbikî divê aliyê wê yê li şaneşîna Padîşah dinêre wiha bibiriqîne ko ji xeml û rewşa wê Padîşah nîkaribe lê binêre.

Efrîtê cinan fermana mîrê xwe pejirand û jê re got:

— Tu rehet rakeve, bila qet xema te nebe! Hîn nebûye sibeh, ezê tevahiya daxwazên te li gorî dilê te û zêdetir jî pêk bînim.

Efrît axaftina xwe qedand û çawa hatibû dîsa wiha di nava mijekê de ji ber çavan wînda bû û çû, Zebeşo jî vegeriya nava qalikên xwe.

Bi berbanga sibehê re, dema roj li navsera çiyayê raserê bajêr bilind bû û tîrêjên xwe da ser welatê di navbera du gol û du çeman de, leşker û zêrevanên Padîşah ên di nobeta sibehê de dîtî ko qesreke ji qesra Padîşah spehîtir û dewlemendtir li pêşberî qesra Padîşah diterisîne! Destpêkê gotin qey xewnerojkan dibînin û bi lez çavê xwe firkandin. Lê qesr bi hemû xeml û rewşa xwe li pêşberî wana diterisand. Qesreke wiha bû ko mû ji ya Padîşah bernedabû; lê ji ber ko tava sibehê tîrêjên xwe rasterast dida ser bedenên qesrê, kemerên wê yên bi zêr û zîvan hatibûn neqîşandin diterisîn û ti çavan nikarîbûn rasterast lê binêrin.

Leşker û zêrevanên Padîşah, dema ji dîtina xwe bawer bûn, bi lez beziyan hundir û agahî gihandin wezîr ko were li vê ecêba dinyê binêre. Wezîr derket ser şaneşîna qonaxa xwe û bi tiştê dibîne nexwest bawer bike. Diyar e gavan soza dabû bi cih anîbû; êdî Padîşah pêwîst bû li ser soz û peymanê xwe rawestiyaba!

Heta wezîr çû dîwana Padîşah, ji mêj ve Padîşah ji xewê rabibû û ber bi şaneşînê ve dimeşîya. Di wê bêhnê de keça Padîşah Ro jî derketibû şaneşînê ko tîrêjên roka berbangê himbêz bike. Ji xwe re kiribû adet ko her sibeh derkeve ser şaneşînê û bêhnekê tîrêjên rojê himbêz bike û hewayê pak a ji navsera çiyên dadikeve, bikişîne kûrahiya kezêba xwe.

Lê, wê berbanga sibehê, kî derket ser şaneşînê, di cih de mat ma û dev û lêvên wî/wê bi hev ve qufilî. Rewş û xemla bajarê wana bi carekê re hatibû guhertin. Qesr û qonaxêke ji ya Padîşah nûtir, spehîtir û rewnaqtir(mûhteşemtir) ko mû ji ya Padîşah bernedaye li hemberî ya wî bilind dibû. Rêyeke ko xaliyên nexşandî li ser hatine raxistin ji vê qesrê heta wê qesrê dirêj dibû. Li her du aliyên rêkê cariyê û xizmetkar rêz dibûn û kêlekên rêkê bi gul û kulîlkan xemilandî bûn.

Ro, bi dîtina vê qesr û qonaxa nû dev li zimanê xwe kir û ji xwe re got; 'Te çi malik li xwe xera kir ko ev şert avêt ber gavên? De bixwe! Tu keça

Padîşahê welatê di navbera du gol û du çeman de ko ji her çar aliyê cîhanê xwezginiyên te dihatin, ji kurê Padîşahan heta kurê wezîran, ji kurê mîr û emîran heta kurê key û qralan tev li ber lingê te digeriyan û tu bi yekî ji wana jî qayil nedibûyî! Niha dawî tu ma ji zebeşekî re. Wey xwelî li serê te be, wey xwelî li bextê te yê reş be!

Padîşah jî bi wezîrê xwe re diaxift û digot:

— Ka du qasidan rêbike vê qesrê û binêre bê kê ev qesir lêkiriye; qesra kê ye? Çi kes e? Fêr bibe û agahiyekê ji min re bîne. Ne mumkun e ko gavanê welatekî di şevê de qesreke wiha lêbike! Hikmetek di vî îşî de heye! Ka zû fêr bibe û bersivekê ji min re bîne...

Lê hîn wezîr bi rê neketiye, leşker û zêrevanên Padîşah salox anîn ko karwaneke xwezgînî bi çel bar zîv û zêr ên li ser dawaran barkirî, wekî xwezgînî tên qesrê!

Di wê bêhnê de, bi berbanga sibehê re gavan û jina wî jî ji xewa şêrîn rabibûn û bi carekê re mat mabûn. Gavan dema dît ko li ser doşekeke qasî bejneke bilind raketiye û di nava çarşef û lihêfên hevrişem de ye; li odeyeke fireh û tije zîv û zêr e û cariyê û xizmetkar sênî û misîn di dest wan de li ber rawestiya ne, rûnişt û dest bi girî kir, dilê xwe bi xwe şewitand û got:

— Wey, wey!... Ez mirime û çûme buhiştê xebera min ji min nîne! Diyar e di dinyê de xêrê min ji gunehên min zêdetir bûn ko Yezdan ez pejirandim buhiştê xwe. Ji xwe re li van ferîşteyan binêre, tev jî çiqasî ciwan û spehî ne?!

Gavan li kêleka xwe nêrî ko jina wî jî li kêleka wî ye! Nema dizanîbû li ber bikeve, yan kêfa xwe bîne? Bi dilekî bi kul got:

— Hurme, sitiya delal ma te kengî jiyana xwe ji dest da û hatî buhiştê? Qey celadên Padîşah serê te jî jê vekirin ko tu hatiyî gel min?

Sarê jî li rewşa hundir, cariyeyên rawestiyayî û çarşefên hevrîşim nêrîbû û mat mabû; lê ji aliyekî ve jî hizirîbû ko ev tev hikmeta Zebeşkê wê ne û di dilê xwe de digot; 'hebe, nebe ev rewş û xeml Zebeşkê min çêkiriye û ezê dawî rabim biçim qesra Padîşah û bibim xwezginiyê keça wî!' Dema mêrê wê qala mirinê kir, zîvirî ser û bi tundî got:

— Mirina çî, buhiştî çî rebeno! Rabe ser xwe û em berê xwe bidin qesra Padîşah ko keça wî ji kurê xwe re bixwazin. Ma tu nabînî Zebeşkê min şertê Padîşah tev bi cih anîne! Ka zû rabe û xwe amade bike ko em bi rê kevin!

Gavan hîn jî bawer nedikir û ji aliyekî ve qurîncek didan laşê xwe ko bi êşê dihise yan na. Dawî her du bi hev re rabûn û derketin şanîşeyê, dîtin ko wa ye qesra Padîşah li hemberî ya wan e û li jêrê, li ser rêkê karwanê ji çel hêstiran pêk hatiye, têrên wana aliyek tije zîv, aliyek tije zêr li ser birêketinê ye.

Cariye û xizmetkaran di misînên zêr de ji wana re av anîn û sabûna kizwanan dan dest wana ko dest û ruyê xwe bişon. Bi destmalkên hevrîşimîn dest û ruyê xwe ziwa kirin û ji bo Sarê heft cariyê, ji bo gavên heft xizmetkar, kiras û fîstanên neqîşandî di dest wana de ketin hundir. Cilên wan ên kevin ji wana kirin û yên nû li wana kirin. Pey re ew derbasî odeya xwarinê kirin. Li ser sifrê ji rûnê nîvişk heta hingivê di nanikê xwe de, ji şîrê şêr heta goştê çûkan her tişt amade bû. Nema dizanîbûn ji kîjanê çî bixwin! Hîn dor nehatibû tamkirina gelek xwarinan, têr xwarin. Ji ser xwarinê rabûn û derbasî salonê bûn. Li wê derê cariyek û xizmetkarek hat û misk û amber bi ser wana de dakir û ketin pêşiya wana ew di deriyê qesrê re derxistin û birin pêşiya karwanê xwezginiyan.

Di wê bêhnê de bajar tev ji xewa xwe hişyar bibû û kî derdiket derve çavên wî li biriqîna qesreke nû bilind bûye diket û di cihê xwe de mat dima. Hinekan digotin qey dinya zîviriye û qesra Padîşah cih guhertiye. Lê

dema li aliyê din dinêrîn û didîtin ko qesra Padîşah li cihê xwe ye, bi hebûna du qesrên wekî hev mat diman û nedizanîn çi helwestê şanî bidin. Di cihê xwe de radiwestiyan û ji xwe re li rewş û xemla qesra nû temaşe dikirin.

Neptî tîrêjên rojê bi tevahî li ser bajêr serdest bû û karwanê xwezginiyan bi rê ket. Gavan û jina xwe di serkê karwan de cih digirtin û her yek çel cariyê û xizmetkar li pey wana dihatin. Di destê her xizmetkarekî de benê hêstirekê hebû ko di têra wê de aliyek tije zîv, aliyek tije zêr hebû. Di destê her cariyekê de jî selikek tije diyarî ji bo Padîşah û malbata wî, ji bo wezîr û malbata wî hebû. Çel cariyên din jî çel sêniyên zêr danîbûn ser serê xwe û di her çel sêniyan de cihêz (rehel) a Royê hebû ko ji cawên hevrîşim heta morîkên kehrîbar, ji gerdaniyên zêr heta xilxal û xizmeyên zîv, ji fîstan û kirasên neqîşandî heta çarî û şerpeyên rengîn, ji pêlavên cûr bi cûr heta kil û kildankên ji Çîn û Maçîn hatine tev li ser sêniyan bibûn lod.

Dawî karwan ghişt ber deriyê qesra Padîşah. Lê Padîşah dîsa jî dilê wî ne rehet bû û bawer nedikir ko gavan şertê wî tev pêk anîbin. Karwan li ber derî da rawestandî û wezîrê xwe û du zanyarên baweriya wî bi wana dihat rêkir qesra gavên ko binêrin ka birastî ye yan xeyalî ye. Heta wezîr û her du zanyar çûn û hatin karwan wiha li meydana li ber qesra Padîşah rawestiya û tevahiya gelheya bajêr li vê ecêba kesî di dinyê de nedîtiye temaşe kir.

Neptî wezîr û her du zanyar vegeriyan û ji Padîşah re gotin ko gavan şertê danîne ber ne kê mî lê zêde bi cih aniye û li hemberî vê pêwîst e Padîşah jî li ser soz û peymanê xwe bimîne.

Ro dema ev salox bihîst her du çavên wê, wekî du lehiyan rondik barandin û bê dilê xwe xatir ji dê û bavê xwe xwest û daket nava xwezginiyan. Çû destê Sarê û Gavan. Çarîka bûkaniyê bi ser ruyê xwe de berda û li hespa

ji bo wê anîbûn siwar bû û berê xwe da qesr û qonaxa Gavên! Bi rê de him digiriya û him di dilê xwe de digot: ‘Pepûkê, hingî te kesek nedieciband dawî tu ma ji zebeşekî re!’

Piştî nîvro karwanê xwezginiyan ên Ro guheztin ghiştin qesrê. Derveyî cariyê û xizmetkaran yê cînar û yê ji bajêr hatine û kesên mereqdar tev belav bûn û herkes vegeriya mala xwe, çû ser kar û barê xwe. Wê rojê garana bajêr jî di nava bajêr de mabû û her yek bi cihekî ve terqiya bû. Bajarî êdî têgihîştin ko ji îro û pê de ji wana re gavanekî nû pêwîst dike û li ser vê yekê, ji xwe re li gavanekî nû geriyan...

Ro, dema hat qesra xwe ya nû, derbasî odeya xwe bû û xwe li ser nivînên bi çarşefên hevrîşim raxistî avêt erdê û giryê xwe domand. Heta ko rondik hew ji çavên wê herikîn giriya. Pişt re çû ber kulîne û zebeşê pê re şû kiriye derxist danî ber xwe û dest pê kir pê re axift û got:

— Hey bextê min î reş, hey qedera min a bêbext, hey xweliya li serê min, hey li min qijik û pepûkê, min çi kir ko bi devê xwe min mala xwe xera kir? Ji kurê qral û keyan, ji kurê wezîr û Padîşahan ez mam ji zebeşekî kall re!’
Ro hîn axaftina xwe wiha didomand, tarîka êvarî ket ser odê; cariyê hatin hundir ko find û çirayan pêxin, lê dema dîtin rewşa Ro ne baş e, jê tirsîyan û paşpaşkî derketin derve. Ode bêtir tarî bû û bi carekê re Ro dît ko zebeşê wê dest bi qelişînê kir. Çavên Ro li nava serê wê bel vebûn û bi awirên matmayî li qelêşîna zebeş nêrî.

Zebeş li halê xwe bû du felqe û xortekî ciwanî bejinziravî çeleng ji navê derket ko bi derketina wî re, ji rewş û xemla wî ode wekî nîvê rojê be, tije ronahî bû. Ro li bejn û bala wî nêrî ko ji kerema Yezdan re qey bi pênuşê li ber rûniştîye û li gorî dilê Ro ew resimandiye! Lêvên lihevhatî yê zirav, çavên girs ên di rengê hingivîn de, ruyê wî yê ji ruyê qîzekê tezetir, porê wî yê wekî keziyên porê qîzikan nerme û gingilokî, stûyê wî yê dirêj û

çenga wî ya giroverî hilû. Eniya wî ya vekirî û fireh, pozê wî yê biçûkî zirav, awirên wî yên himbêzkar û nerme...

Tev li gorî dilê Royê bûn û Ro dema çav li vî xortê bedew ê ji nava Zebeş Za ket, ne bi dilekî, bi heft dilan dil ket vî xortî. Ji xort re got ko ji sedema dida girî bila lê bibore! Di dilê xwe de digot qey bi zebeşekî bê ruh û bê can re şû kiriye, lê nizanîbû bi vî xortê bedew û spehî re jiyana xwe kiriye yek. Xort himbêz kir û got:

— Li min biborîne! Cara yekem e ez xortekî wekî te spehî û bedew dibînim. Ka ji min re bêje tu ins î, tu cins î; tu çi mirovî ko te di şevê de şertê bavê min daye ber bavê te pêk aniyî û bûyî xwezginiyê min? Ka ji min re bêje, te li ko nav û dengê min û xweşikbûna min bihîstibû ko te çav berda min û heta min neguhest nerawestiyayî?

Xortê ji nava Zebeş zaye jî ew himbêz kir û bedenên xwe kirin yek û got:

— Her tiştê dema wê heye; dema roja wê were tê her tiştî fêr bibî. Niha ne dema van pirsan û bersivdayîna van e. Niha em ji hev re hezkirina xwe diyar bikin û şeva xwe bi xêr û kêfxweşî, bi coş û neşe biborînin. Dema bibe sibeh wê daweta me lidar bikeve û tevahiya hemwelatiyan wê werin di dawetê de bireqisin, govend û dîlanê bigrin. Wê demê tê li ser banê qesrê li gel heval û cariyeyên xwe temaşe bikî û ezê jî dakevim nava xort û mêrxasan govendê bigrim û bireqisim. Wê her kesê min bibîne mat bimîne û ji hev bipirse ko ev xortê bedew û spehî kî ye? Zanibe ko tu tenê dizanî ez hevalê te yê jiyane me. Wê gelek hevalên te yên keç werin gel te û tevezên xwe bi te bikin ko tu çima bi yekî wekî min re şû nekiriyî û çûyî, bi zebeşekî re şû kiriyî? Tu çiqasî bidî şermê, çiqasî werî acizkirin û tengavkirin jî pêwîst e tu vê veşareya min (sir) dernexînî derve û ji ti kesî re nebêjî, 'Ev xort mêrê min e!' Ger tu li min mukir werî, ezê bibim çûkekî heft rengî û bifirim biçim ko tu heft salan û heft rojan bi heft gopal û heft çaroxên hesin li min bigerî tu min nabînî!

Ro, soz û peyman da ko veşareya wî eşkere nake û got:

— Ma ez dîn bûme ko ev qismetê ji ber xwe ve hatiye ji min re, ez bi destê xwe bidim firandin? Ti caran û ti caran ez li te mukir nayêm û te ji xwe dûr nakim û xwe ji te dûr nagrim! Ma di vê dinyê de gelo yekî din ji te çelengtir û spehîtir heye ko ez te ji xwe dûr bixim? Ez ne bi dilekî, bi heft dilan dil ketime te û ti caran veşareya te eşkere nakim.

Wê şevê heta berbagnga sibehê her du ciwan, her du dildar û her du evîndar ji xwe re gengeşe, henek û sihbet kirin. Şeva xwe bi kêfxweşî, dilşadî, coş û ken borandin. Dema dîkê berbangê bang da, Zebeşo careke din veşariya nava qalikên xwe û Ro nû dest bi xewê kir. Heta ko rok bejneke bilind bû û tevahiya dawetiyên hatin li hewşa qesrê kom bûn û dengê def û zirneyan, bilûr û tenbûran di ezmanan re derket jî, Ro hîn di xewê de bû...

Dawî bi banglêkirina cariyeyan ji xew rabû û bi çel tas şîrê miyan laşê xwe ji serî heta jêrî şûşt, pişt re ket hundirê tasa ava bi misk û amber tê de û xwe pak kir. Dawî cariyeyan cilên wê yên diyariya malbava wê ya nû anîn û lê kirin. Cil tev bi tayên zêr hatibûn dirûtin û bi neqşên zîv û zêr hatibûn xemilandin û ji hevrîşimê Çîn û Maçînê hatibûn qusandin. Ro ya ewqasî xweşik û bedew di nava cilên zîv û zêrînî de sed taq xweşiktir û spehîtir bibû. Dawî derbasî ser sifreya xwarinê bû û ji xwarina bi çel cûreyan hatiye amadekirin, taştê xwar. Pişt re bi cariyeyên xwe re derket ser banê qesrê ko temaşeyê daweta xwe bike.

Li bexçeyê qesr û qonaxa kurê gavên ji her aliyê welêt mêvan hatibûn. Wekî din ji welatên cînar jî bi sedan mirov hatibûn ko ji xwe re li xweşikbûna keça Padîşah û kurê gavên binêrin. Lê yên ji welatên xerîb hatibûn dema dibihîstin ko ev keçika ewqasî bedew bi zebeşekî re şû kiriye, xweziya wan di qirika wan de dima û di cih de sar dibûn, nema dizanîbûn çî bikin û çî bêjin.

Li hewşê ji tenbûrvanan heta bilûrvanan, ji dengbêjan heta sitranbêjan, ji qirdikan heta qeşmeran herkes kom bibû û her yekî hunera xwe dadixist holê. Dahol ji milekî ve bi zirneyê re, saz ji milekî ve bi kemançeyê re, tef ji milekî ve bi erbanê re lê dida û her civatek li ber yekê direqisîn, govend û dîlan digirtin û kêf û şahî dikirin. Xizmetkar û cariyeyan bi misînên zîv û zêrîn şerbeta ava hinaran û ava sûsê belav dikirin. Tasên dewê cemidî ji destan nediketin. Li aliyê din her cureyên fêkî li ser sifreyan rêz kirî bûn û kî dilê wî/wê çî bixwesta diçû bi xwe radihiştîyê û dixwar. Ji hinarên qaşûl reşî libşêrîn bigir heta hinarên miz û tirş; ji sêvên xelatî bigir heta alesor û hirmî û qarçiyar; ji hejîrên reş bigir heta yên zere û girs; ji tiriye teyffî bigir heta yê mezone; ji xox û mişmişan bigir heta goz û biîvan; çî fêkiyên welatê di navbera du çem û du golan de hebûn tev li wê derê kiribûn lod û herkesî heta di dev û bêvila wî/wê re biavêje jê têr dixwar û cardin vedigeriyar reqs û dîlana xwe. Ji bo kesên dilê wan bixwaze lodên sewze jî hatibûn lêkirin; ji zebeş heta petîxan, ji şerengo heta tirozî û qitiyan her tişt amade bû. Li aliyê din çel distên mezin li kêleka hev rêz kiribûn û goştê çel dawarî tê de dikelandin. Di çel distên din de savar û di çel distên din de jî tirşik (metfûnî) dihat kelandin û bêhneke xweş bi ser dawetiyar diket! Li aliyekî din ê baxçeyê qesra kurê gavên xort û ciwanên mêrxas û çeleng tîr û rim diavêtin armancê û li hespên keel swar dibûn bi cirît dileyistin. Li aliyê dîlan û govendê jî jin û zîlam, zarok û kal û keç û xort tev di destên hev de dîlaneke mezin û geş girtibûn û her yek çî hunera wî/wê hebû datanî holê. Tam di dema ko dawet têra xwe geş bibû de, xortekî bedewî spehî yê kesekî nizanîbû ji ko derê hat, ket dawetê û dest bi reqsê kir. Bi hatina wî re rewş û xemla wî bi carekê re ronahiya xwe bi ser a rokê xist û awirên herkesî kişandin ser xwe. Reqş û dîlaneke wiha leyist ko herkesî reqş û dîlana xwe berda û temaşeyî bejn û bala wî û hunera wî ya reqş û dîlanê kirin. Yê li defê dide, yê li zirneyê dide, yê li tef û erbaneyê dide,

yê li tenbûr û ribabê dide tev dest ji karê xwe berdan û hatin li pêşiya vî xortî rawestiyan û destpê kirin, ji bo wî hunera xwe raxistin ko bikaribin bigihêjin dewlemendiya hunera wî...

Di wê bêhnê de heval û cariyeyên Ro yên li ser qesrê li kêleka wê rûniştî, dema çav li vî xortê ji nediyariyê hatiye ketin, her yek ne bi dilekî, bi heft dilan dil ketin vî xortê bedew û spehî û her yekê ji aliyekî ve li nava serê Royê dan û gotin:

— Pepûkê, qijikê, tu keça Padîşahê vî welatî bû; ji te re xortekî wekî vî spehî û çeleng pêwîst bû! Te ji xwe re ev xortê bedew nekir, tu çû bi zebeşekî re şû kir! Ma mirov wekî te dike? Qey te hişê xwe xwaribû?

— Lê binêre çiqasî xortekî çeleng e!? Li wan çavan binêre, li wan milên fireh binêre, li wê bejna zirav û tenik binêre, li wê bejn û balê binêre! Ma mirov diçe bi zebeşekî kall re şû dike? Te ji xwe re ev xort bixwesta ko heta heyî tu pê şa bibayî û serbilind û dilşadbayî! Li te pepûkê, ma qey te hişê xwe bi nan û penêr xwaribû ko te çû kurê gavanekî kir? Te çima ev xort nekir?

Ne yek, ne du, ne deh... yer yekê ji aliyekî ve li nava serê Royê dan û jê re gotin ko çi qijik û pepûk e ko çima bi vî xortê spehî û bedew re şû nekiriye û çûye bi zebeşekî kurê gavanê welêt re şû kiriye. Ewqasî gotinên xwe dubare û sêbare kirin ko hişê wê xwarin, mejî di serê wê de nehiştin û ew ji hal de xistin, kelegirî kirin. Dawî Ro ya bêbext hew dikarîbû li ber xwe bide û qêriya got;

— Hûn bimrin jî, biteqin jî ew xortê hûn qalê dikin, ew mêrê min e, Zebeşo ew bi xwe ye!

Dema wiha got; ji nivşkê ve dawet tev rawestiya û bêdengiyeye ji ya berya qiyametê bêdengtir ket ser hewşa qesra kurê Gavên û di wê bêhnê de ew xortê spehî yê ji nediyariyê hatibû, bi carekê re bû çûkekî heft rengî û fir da xwe bi hewa ket û firiya çû!

Keça Padîşah ji ser banê qesrê rabû ser xwe û qêriya, got:

— Çû, çû; çûkê min firiya çû; zû wî bigrin...

Lê kesekê/î wate neda van gotinan û herkes awirên wan li jorê daliqandî man, li firîna çûk nêrîn û ti wate nedan bûyerên diqewimin.

Dîsa di wê bêhnê de ewrên reş û tarî ji navsera çiyar xwe berdan û hatin girtin ser tevahiya welatê di navbera du çem û du golan de. Dinya wiha tarî bû ko dawetiyar tilî bixista çavên hevûdu kesî kesek nedidît. Dawetî tev belav bûn û her kes bi çavkorî rêka mala xwe girtin.

Di wê bêhnê de keç û jinên cer û şerbikên xwe biribûn ser kaniyê avê dagrin, dîtî ko li cihê ava spehî aveke sor û xwînî diherike û cer û şerbikên wan vala vegeyriyan malên xwe.

Dîsa di wê bêhnê de bêrîvanên li ber bêriyê ji mîh û bizinan şîr didotin dîtî bi carekê re ji guhanên pez ne şîrê spî, xwîn tê dotin û dev ji dotinê berdan û berê xwe dan nava bajêr ko bîr malên xwe.

Zû, ne dereng salox gihişt Padîşah û jê re gotin, li welatê wî tofanek rabûye û ji kaniyan ava sor diherike, ji pez xwîn tê dotin û ewrên reş û tarî girtine ser her alî ko çav çavan nabîne!

Padîşah civata şewirmendên xwe li dar xist û yek bi yek raya wan girt ko dikarin çî bikin. Şewirmendên wî kesên rîspî û zanyar bûn; têdigihiştin ko li welatê wana tiştên ne asayî bi rê ve diçin û ji bo vê ji Padîşah re gotin ger çî hatibe serê wana û welatê wana keça wî Ro pê dizane!

Li ser vê yekê Padîşah bi wezîr û şewirmendên xwe re derket derve û berê xwe dan qesr û qonaxa keça xwe.

Di wê bêhnê de Ro bi cariyeya xwe ya herî zêde bawerî pê dianî re çûbû gel serhesinkarê bajêr û ferman dabûyê ko heta sibehê jê re heft çarovê hesin û heft gopalê hesin çêbike û bîne bide wê. Serhesinkar, şagirt û hesinkarên dinasîn tev kom kirin û dest bi çêkirina heft çarox û hevt gopalên hesinî kir.

Ro dema vegeriya qesrê dît ko va ye bavê wê, wezîr û heyeta şêwirmendan tev li hêviya wê rawestiyane. Ro dema çav li bavê xwe ket, xwe avêt himbêza wî û têr giriya. Piştî ko rondik hew ji çavên wê bariyan, li kêleka bavê xwe rûnişt û jê re ta bi derziyê vekir.

Roja ko wê guheztin û anîn qesrê çawa da girî û ji binê kulînê çawa zebeşê pê re şû kiriye derxistiye û çawa dest bi gazindan kiriye, zebeş çawa ji nivşkê ve qelişiyê, xortekî heta wê rojê xortên wekî wî spehî û bedew nedîtiye çawa ji nava zebeş derketiye û çawa pê re axiftiye, veşarteya xwe çawa jê re vegotiye û çawa gotiye ger lê mukir were wê bibe çûkekî heft rengî û ger heft sal û heft rojan bi heft gopal û heft çaroxên hesin lê bigere nabîne û sibê çawa daketiye dawetê û govend girtiye, dema ew di govendê de hevalên wê yên keç bi pitepit û gazindan çawa mejiyê serê wê xwarine û hişê wê ji serê wê birine û ew jî mukir hatiye û gotiye, 'Ev xortê hûn qalê dikin mêrê min Zebeşo ye!' û di wê bêhnê de Zebeşo bûye çûkekî heft rengî û firiyaye çûye û bi wê bêhnê re jî ewrên reş û tarî girtine ser welêt û ji kaniyan ava sor, ji guhanên pez jî xwîn herikiye û li ser vê yekê çûye gel serhesinkar û ferman daye heta sibehê jê re heft gopal û heft çaroxên hesin çêbike, ji bo bi berbangê re, bi rê bikeve û li çûkê xwe yê heftrengî bigere!...

Bi vî awahî Padîşah, wezîr, heyete şêwirmendan û keça padîşah Ro şêwra xwe kirin yek û Ro xatir ji wana xwest ko bi berbangê re bi rê bikeve û li hevalê xwe yê jiyane bigere!

Dema bû sibeh serhesinkar heft gopal û heft çaroxên ji hesinê pola çêkirine anîn û dan keça padîşah. Ro çaroxeke hesinî xist lingê xwe, gopalekî hesinî hilgirt destê xwe û yên din tev xistin tûrê xwe, kêseke zêr girt cem xwe û xatir ji malbata xwe xwest û berê xwe da ser rêka derdikeve derveyî bajêr.

Bi derketina wê re padîşah ferman da wezîr ko li tevahiya welatê di navbera du gol û du çeman de belav bike; heta keça wî bi zilamê xwe re venegere ser vê xakê, ew li tevahiya welêt şînê beyan dike. Heta wê rojê wê ne kes şû bike, ne dawetan li dar bixe, ne dilê xwe bi tiştêkî şa bike û ne jî şahî û kêfxweşiyekê li dar bixe. Û roja keça wî û zilamê wê vegrin, kî vê saloxê destpêkê bigihêne padîşah wê tevahiya zêrên di xezîneya xwe de li ber wana raxîne û qasî dilê wana bixwaze wê bikaribin jê ji xwe re bibin!

Wezîr di nava bîst û çar saetan de ev agahî gihand tevahiya şênîyên li welatê di navbera du gol û du çeman de cih digre û di demeke kin de ev salox ji welatê Ariyan heta welatê Samiyan, ji welatê di navbera sê behran de heta welatê hevrîşim û kehrîbaran belav bû...

Ro ji welatê bavû kalên xwe, ji xaka dê û dapîrên xwe veqetiya û ket ser rêka xerîbiyê. Çem û robar qut kirin; bi lotkeyan di ser ava gola mezin re derbas bû; di navser û neqebên çiyayên bilind û asê re, di geliyên kûr û newalên fireh re meşiya. Zozan derbas kirin daket beriyan, di qelaç û kiryan re berê xwe da çol û cebelan. Ji bejahiyê hilkişiya nava daristanan; ji bax û bistanan daket nava gul û gulistanan. Roj bû di ser sitiriyên re meşiya. Roj bû di nava av û leyîyan de rêve çû. Roj bû li ser berf û li ber seqemê raza. Roj bû bi ba û bahozan re pevçînî. Roj qulipîn, hefte derbas bûn, meh zîvirîn, demsal boriyan û di dawiya sala yekem de gopâlê wê yê di destê wê de qelişt û hew dikarîbû ji xwe re bike destek. Di wê bêhnê de nêrî ko sola di lingê wê de jî tev mihiyaye û binê wê kun kunî bûye. Li ser latekê rûnişt û pêlava xwe (sola xwe) ji lingê xwe kir; ji tûrikê xwe soleke nû derxist û xist lingê xwe. Gopâlê qeliştî danî kêlekê û gopalekî nû hilgirt destê xwe û careke din ket ser rêkê ko li hevalê xwe yê jiyanê, li çûkê xwe yê heft rengî bigere,

Li ber tavên germ ruyê wê kizirî, li ber sermayên dijwar tenê wê çilmisî. Porê wê ji neşûştinê bû gijikî; nenûkên wê tev şikestin û lêvên we tev terikîn. Bi şev stêrk ji xwe re dikirin rêber, bi roj li roka wekî navê xwe bi xêr û bêr dinêrî û dimeşiya. Ji çalên bê werîs û bê dewl, ji hewdên têr zîro û kurm av vexwar û bi pelçîmên dar û deviyar, bi giyayê zozan û beriyan zikê xwe têr kir. Roj bû li mala gavanekî, roj bû li konê şivanekî bû mêvan. Di kêleka gundan re derbas bû; di ser bajaran re qulipî; li qesr û qonaxan rast hat; lê ti caran baweriya xwe neşikand ko nikare çûkê xwe bibîne. Çi bi serê wê hat, kir tawana xwe û her di dilê xwe de got, 'Yezdan qismetekî bedew dabû min, lê min qiymetê wî nezanî û ji dest xwe berda; çi were serê min heqê min e!'

Li welatê xeribiyê saleke din û yeke din û yeke din derbas kir. Di xelaseka her salê de coteke pêlav û gopaleke hesinî mihand û yên nû bikar anî. Li gelek mirovên camêr û li gelek dayikên dilperitî û li gelek keç û jinên kezepsojî rast hat. Gihîşt ko derê serpêhatiya xwe û sedema gera xwe ji wana re vegot û pirsyara çûkê xwe yê heftrengî kir. Her kes û civata li serpêhatiya wê guhdarî dikir dilxemgîn û dilbiêş dibûn; rondik ji çavên wan, keser ji hinava wan dibariyan û dilê xwe bi vê keça spehî û delal dişewitandin. Hinekan ew dawetî xwarinê dikirin, hinekan dixwest li gel wana bimîne û bibe keça wan a malê, hinekan dixwest wê ji xwe re bikin evîn û yar, hinekan dixwestin rê û rêbaran nîşanî wê bidin, hinekan dixwest wê ji doza wê dilsar û bêhêvî bikin û vegezin. Lê ti kesî qala dîtina çûkê wê yê heftrengî nedikir. Herkesî digot:

— Dayika min, xwişka min; di vî welatê bê ser û bê ber de, ma mumkun e ko tu bikaribî çûkekî bibînî? Li nava van dar û deviyar, li ser van lat û zinaran bi hezaran çûk hene ko ne bi heft rengan bi hefsed rengan xemilandîne. Emê niha rabin ji bo te derkevin nêçîrê û bi dehan çûk bigrin û bînin li ber te deynin; bes tu xwe xemgîn neke û li ser xaka me bimîne!'

Lê Ro bi biryar bû û ti hêz û ti kesî nikarîbû ew ji ser biryara wê daxista xwarê. Piştî guhdarkirina li herkesî, careke din radibû ser xwe, pêlava xwe ya hesinî dixist lingê xwe, gopalê xwe yê hesinî hildigirt destê xwe, pêxwariniya jê re amade kirine diavêt ser milê xwe û diket ser rêka ji gund dûr dikeve û berê xwe dide nava lat û zinarên çûk û teba li ser dijîn ko di nava wan de çûkê xwe yê ji destê xwe firandiye bibîne!..

Di dawiya sala heftan de êdî ne pêlavek ne jî gopalek pê re mabû ko bixe lingê xwe û bigre destê xwe. Ji roja xatir ji malbata xwe xwestibû û bi rêka xeribiyê ketibû heft sal derbas bibûn û heft roj jî bi ser ketibûn. Êdî dayika wê jî ew bidîta nas nedikir. Cilûbergên li ser tev qetiya bûn û di lingê wê de pêlav, di destê wê de gopal nemabûn. Piştî wê qilûz û awirên wê kêmbibûn. Porê wê tev şikestiyayî û weşiya bû. Derman ne di kabên wê de, ne jî di laşê wê de mabû...

Kelkela havînê bû û roj îroj ji her demê zêdetir xwe nêzî erdê kiribû û bi hemû diywariya xwe tîrêjên xwe berdidan ser mejiyê wê û hişê wê yê maye jî ji serê wê dibir; xwêya di laşê wê de tev dida der û dev û lêv lê dikirin wekî çola bi hesreta avê. Li beriyêke wiha dimeşiya ko ne serê wê diyar bû û ne jî binê wê. Berî tev ji ber û kevirên tûjî reş hatibû xemilandin û sitiriyên hişk di nava ber û keviran de hatibûn çandin.

Ro ji dûr ve dît ko wa ye şivanek li nava ber û keviran bi sitiriyayan pezê xwe diçêrîne; li ser tehtekê rûniştiye û ji pezê xwe re li bilûrê dide. Ji bilûra wî dengêkî bi şewat û bi jan hildibû ko dilê Ro peritand û wekî bi sêhrê be ew bi ber xwe ve kişand. Dema nêzîkatî li şivên kir, şivan bi hatina wê hisiya û bilûra xwe betal kir, xêrhatinî li vê sitiya bedew a westiyayî kir. Cihê rûnê nîşanî wê da û ji tûrê xwe taseke sifir derxist, çû nava pez ko jê re çend miz şîr bidoşe.

Piştî sitiya xerîb û perîşanbûyî têr vexwar, şivan nû jê pirs kir bê kî ye û çî karê wê li vê çol û cebela bê serî û bê binî heye?

Ro çawa ko li her derê, digihişt kê serpêhatiya xwe digot û pirsyara çûkê xwe yê heftrengî fikir, di dilê xwe de got, 'Ev kes şivan e, her roj li çol û cebelan e; ka ez serpêhatiya xwe ji wî re jî bêjim, belkî li rastî çûkê min hatibe û deriyekî xêrê li ber min veke!'

Bi vê ramanê Ro dest bi vegotina serpêhatiya xwe kir. Her wê vegot û şivan guhdar kir. Ji roja gavan hatiye û ew ji bavê wê xwestiye û şert avêtine ber gavên û heta pêkhatina şertê wê û guheztina wê ya mala gavên; dîtina xortê bedew ê ji nava qalikê zebeş derketiye, gotin û veşareya xortê çeleng jê re gotiye; daketina wî ya nava dawetê û girtina dîlan û govendê; li hember zextên keçên hevalên xwe mukirhatina xwe ya bê hemdê xwe û pê re ji firîna çûkê wê yê heftrengî; heta heft sal û heft rojên di xeribiyê de bi pey çûkê xwe borandiye, tev ji şivên re ta bi derziyê vekir û dawî ji wî jî pirs kir bê ka çûkê wê dîtiye yan nedîtiye?

Şivan dilê xwe bi vê sitiya ciwanî bedew a di hemû zor û zahmetiyan re derbas bûye şewitand û bîra xwe vekola ko bikaribe alîkariyê bideyê. Bêhnekê ponijî şûn re got:

— Sitiya delal, nizanim çûkê te ye yan na; ev demek e her êvar çûkekî wekî tu qalê dikî, berya tarî bikeve erdê tê û dikeve bin kevirê reş ê li wê derê! Min jî mereq kiriye ko ez zanibim ev çûkê xweşik bê ji ber çi hêlîna xwe di binê vî kevirê de çêkiriye. Tu dizanî ko ti çûk hêlîna xwe di binê keviran de çênakin. Min çûk ji nêz ve nedîtiye, lê dema dikeve bin kevir li ber tava êvarî periyên wî tev rengorengo diterisin û dibe ko çûkê tu lê digerî ew çûk be!

Ro ji kêfan re xwe avêt situyê şivên û ew himbêz kir. Ne carekê bi sedanê caran jê spazî kir û kîsê di paşila xwe de derxist çi zêrên tê de mabin tev rijand dawa şivên û li ber geriya ko wî kevirê reş şanî wê bide.

Şivan zêrên Ro ji dawa xwe kom kirin û dîsa xist kîsikê wê û got:

— Sitiya delal, ma qey mirovahî miriye ko ez cihê çûkekî li hemberî kîseke zêr şanî te bidim? Ez mirovekî şivan im; ji sibehê heta êvarî li xwezayê pezê xwe diçêrînim û êvariyan jî sitêrkan ji xwe re dikim lihêf û serê xwe datînim ser berekî reş, ji yezdan re berger dikim ko rêwingiyekî bi ser min de rêbike, bikaribim taseke şîr deynim ber, li gotinên wî/wê guhdarî bikim û ji xwe re du – sê peyvan jê fêr bibim. Te îroj bi hatina xwe ez dilşad û bextewar kirim. Tu dayik û xwişka min û mêvanê min a ezîz î. Niha emê xwe li pey vê latê veşêrin û awirên xwe berdî ser vî kevirê reş ê ez û tu li ser rûniştine. Bêhneke din berya sî bikeve ser beriyê wê çûkê em qalê dikin were û bikeve binê vî berî. Tu jî bi çavên xwe lê binêre. Ger çûkê te be, tê binasî û wê demê dilê te çawa dixwaze tu dikarî wiha bikî.

Ro careke din bi gotina şivan û camêrî û mêrxasiya wî kêfxweş bû û her du derbasî paş lata bilind bûn û bi dizî çavdêriya kevirê reş kirin.

Neptî zû ne dereng, hîn siya çîyan nû daketiye ser kêleka beriyê, dîtin ko ji nediyariyê çûkek hat û li ser kevirê reş danî û wekî li derdora xwe temaşe bike du sê fitlonek dan xwe û pişt re daket erdê, di bin ber de ji ber çavan nediyar bû û çû.

Ro dikir ko dilê wê were ber devê wê û qîr bide bang li çûkê xwe bike! Lê ji ber ko carekê bi zimanê xwe nekarîbû, ji bo wê bibû westandin û hesreta heft sal û heft rojan.

Piştî çûk di binê kevirê reş de nediyar bû, Şivan û Ro ji pey latê derketin û şivan got:

— Ji rewşa te û kêfxweşiya te diyar e te çûkê xwe dît! De ka rabe alîkarî bide min ko em berê pez bizîvirînin û bidin malê. Îşev li mala me bibe mêvan û em şêwra xwe deynin ko sibe qeraseyekî bi xwe re bînin, kevirê reş bilind bikin û hêlîna çûkê te bibînin.

Ro ev pêşniyar pejirand û alîkarî da şivên ko pez komî serhev bikin û berê wê bidin malê. Heta ghiştin malê tarî ket erdê û pez xistin govê, derbasî

ser banê xanî bûn. Jina şivên ew bi dilekî germ pêşwazî kir û ji wana re sifreya xwarinê danî. Piştî xwarinê Ro daxist xwarê û jê re av germ kir, li ber rûnişt bi heft qalip sabûn serê wê şuşt û qirêja laşê wê paqij kir. Pişt re bi heft şehên hestînî porê wê şeh kir heta hate xwarê. Ji kulînê kirasekî xwe yê ji bûkaniyê maye derxist û lê kir. Pişt re gavekê vekîşiya paş de û li ber ronahiya çirayê ji xwe re li vê bejn û bala lihevhatî ya spehî nêrî û dilê xwe bi vê mêvana delal şewitand ko çawa heft sal û heft rojan bi pey çûkekî ketiye û li van çol û cebelan perîşan bûye!

Ro di van heft sal û heft rojên ji malbava xwe veqetiyaye û bi xerîbiyê ketiye de, cara yekem bû bi dilekî rehet, xeweke têr kir. Dema dîkê berbangê bang da, tev bi hev re rabûn û ji şîr û nîvişk taştê xwarin û bi şivên re berê pez da cihê kevirê reş ê çûkê heftrengî ketibû binê. Heta pez ghişt ber kevirê reş, Rok bejneke bilind bibû û germahiya xwe dabû ser beriyê. Şivan pezê xwe berda çêreyê û ji tûrê xwe qerase derxist û hat ber kevirê reş rawestiya. Qerase xist bin kevir û ew û Ro bi hev re hêza xwe dan ser û kevirê reş bilind kirin. Dema kevir bilind kirin dîtî ko ne hêlîna çûkekî, devê şikeftê di binê kevir de ye.

Ro keçeke jîr û hişmend bû; têghişt ko çûkê wê li vê derê ne tenê ye û hikmetek di vê şikeftê de heye. Ji bo wê spaziya xwe ji şivên re kir û got: — Birayê delal, ez vê qenciya te ti caran jibîr nakim. Ezê niha dakevim hundirê şikeftê û heta êvarî sî bikeve ser beriyê, li hêviya hatina çûk bimînim; lê ji bo nizanibe kes ketiye hundir û li hêviyêye, tu bi pey min re kevir dîsa deyne cihê wê û wekî berê bike.

Ro piştî gotina xwe qedand, daket hundirê şikeftê û şivan pey re kevir dîsa gêrî ser devê şikeftê kir û anî sêra berê.

Ro di hundirê şikeftê de bi çavkorî meşiya û ji xwe re qorziyek dît, xwe tê de veşart û li hêviya êvarî ma.

Dema bi xwe hisiya ko Rok ber bi êvarî ve diçe, di qorziya xwe de awirên xwe dirêjî devê şikeftê kir û bi gurme gurma dilê xwe, li hêviya hatina çûkê xwe ma.

Neptî zû ne dereng, reşahiyek, di bin kevirê li ser devê şikeftê re firiya hundir û bi ketina wî ya hundirê şikeftê re, şikeft weke bibe nîvê rojê wiha ronahî bû. Çûk hat û li nîvê şikeftê rawestiya; du sê fitlonekan li derdora xwe fitilî û pişt re baskê xwe ji hev vekirin û xwe dawêşand; bi carekê re bû xortekî spehî û bedew ko roja yekem çawa ji nava qalikên zebeş derketibû û Ro bi heft dilan dil ketibûyê, dîsa bi wê bedewî û spehîbûnê derketibû holê. Ro careke din bi dîtina wî ne bi dilekî bi heft dilan dil ketyê û ji qorziya xwe lê veşartiyê derket û xwe avêt hembêza hevalê xwe yê jiyanê yê ko hîn bi hev şa nebûne û heft sal û heft roj in bi hesreta dîtina wî bi çol û cebelan ketiye, li welatên xerîbiyê heft çarox û heft gopalên hesin mihandiye...

Xortê bedew dema Ro dît veciniqî û bi ser de qêriya ko bi çi hiş û aqilî hatiye ketiye vê şikeftê û got:

— Min ji te re negot bi pey min nekeve û ger tu heft çarox û heft gopalên hesinî bimihînî jî tu min nabînî? Ka bêje tu çawa hatiyî vir û kê ev der şanî te daye. Ma tu nizanî vê derê şikefta Dapîra Mîrê Cinan e!? Bêhneke din wê Dapîra Mîrê Cinan were û çawa bikeve hundir wê bêhna te bike û hû bike te, te bê giyan bike û daqurtîne! Te serê xwe jî xist belayê, serê min jî xist belayê. Tu li min mukir nehatibayî, evqase tişt ne bi serê min dihat, ne jî bi serê te dihat. Ji ber ko tu li min mukir hatî, Dapîra Mîrê Cinan ez anîme vê derê û ez siza kirime ko heta heye jê re xizmetê bikim. Niha ko were hundir wê bêhna te bike û hû bike ser te, bi hilma devê xwe wê giyana te bistîne û te ji xwe re bike şîv!

Ro wiha hizirî ko hevalê wê yê jiyanê ji bo çavê wê bitirsîne û wê rêbike malê wiha dibêje. Lê piştî geryana heft sal û heft rojan ko gihiştibû hevalê

xwe çawa dikarîbû dev jê berdaya û destvala bi ser hemwelatîyên xwe de vegeyriyaya?! Destên xwe avêt derdora situyê hevalê xwe û got:

— Êdî li ser ruyê vê dinyê ji min re bêyî te jiyan nîne! Vê yekê zanibe ko ji vê gavê û pê de ez bimrim bi te re me, ez bimînîm bi te re me! Ne Dapîra Mîrê Cinan, eşîra mîrê cinan tev werin û hû bikin ser laşê min û min qet qet bikin daqurtînin, ez dîsa terka te nakim û dev ji te bernadim. Ger mirineke min hebe, bila ne bêyî te, li gel te be!

Bi vê gotinê agir ket dilê xortê spehî û rondik herikîn ber mijankên wî. Bi destê hevala xwe ya hîn ti xêr ji hev nedîtine girt û got:

Hevala min, jîn û evîna dilê min; ka guh bide ser gotinên min ko ev roja xêrê li min û li te nebe roja me ya dawî! Bêhneke din wê Dapîra Mîrê Cinan were hundir û ji heybeta wê, wê bibe kurpe kurpa dilê te û tê bidî ber qîran! Lê qe ne vê carê bi ya min bike û bi zimanê xwe karibe. Niha ezê heft den û heft devikên wan bînim û te di hundirê wan de veşêrim. Dema Dapîra Mîrê Cinan were hundir divê tu qet dengê xwe nekî û hilma xwe jî nestînî û bernedî! Wê dapîr çawa bikeve hundir bi ser min de hil bibe û bêje; ‘Bêhna mirovan tê min! Ka ew mirov li ko ye; bîne ez hû bikimê ko bê giyan bikim û daqurtînim bixwim!’ Wê gavê ezê sond bixwim û bêjim ko li hundir ti mirov nînin û ji ber xwe ve bêhn dike. Lê wê ew ji min bawer neke û bang li te bike ko tu derkevî derve.

Destpêkê wê nav di xwe de bide û bixwaze te bitirsîne ko tu derkevî derve; lê tu tu bî, ti caran bi tirsdayînên wê dernekevî derve; ger tu derkevî, di cih de wê hû bike ser te û te bê giyan bike û daqurtîne!

Piştî ko bi navdayîna xwe tu derneketî, wê soz û peymanan bide te û bixwaze te wiha bixapîne derxîne derve; lê tu tu bî, ti caran bi sozdayînên wê nexapî û dernekevî derve; ger tu derkevî wê ev bibe dawiya te û herwiha dawiya min!

Dema dît ko dîsa tu derneketî derve, wê demê wê bêje, ‘Derkeve ey çêlîka mirovan, bextê min ji te re, were li ber min raweste û daxwaza xwe bêje ko ez te azad bikim!’

Wê gavê êdî tu dikarî ji kawaran derkevî lê tu tu bî ti caran ji pêş ve tu xwe nêzî Dapîra Mîrê Cinan nekî; her çiqasî bext bide te jî dîsa heta tu şîrê wê nemijî baweriya xwe pê neynî û dernekevî pêşberî wê. Dema tu ji kwarê derket bi dizî ji paş ve xwe nêzî wê bike û rahêje guhanê wê bixe devê xwe û di nava diranên xwe de bişidîne. Wê ew xwe bi vî alî û wî alî de bihejîne, wê xwe hilavêje û deyne ko guhanê xwe ji nava dev û diranên te veqetîne; lê tu tu bî, ti caran guhanê wê bernede heta ko ji te re bêje; ‘Temam çêlîka mirovan min bext da te, êdî tu dikarî werî hizûra min û daxwaza xwe ji min re bêjî!’

Dema Dapîra Mîrê Cinan wiha got, ‘Min bext da te’ êdî divê tu zanibî ko ti zirara wê nagihêje te û tu dikarî guhanê wê berdî, werî hizûra wê û daxwaza azadberdana min û xwe bikî!

Ro, yek bi yek peyvên hevalê wê gotin guhdar kir û ket hundirê heft denên hevalê wê anîn û heft qapax bi ser xwe de girtin ko Dapîra Mîrê Cinan zû bi zû bêhna wê neke.

Bêhneke din, wekî erd û ezman tev biheje şikeft ji cihê xwe lerizî û gurminiya dengê lingê Dapîra Mîrê Cinan li ber derî hat. Ji gurmînî û hurminiya jê dihat kezeba Ro hat ber devê wê û hindik mabû ji tirsan re dilê wê rawestiyaba. Lê, hevalê xwe û gotinên wî anîn bîra xwe û wêr da xwe, di cihê xwe de rûnişt û li hêviya ketina dapîrê ya hundir ma.

Neptî kevirê ber devê şikeftê hat hilgavtin û Dapîra Mîrê Cinan ket hundir. Çawa gava xwe avêt hundirê şikeftê bi ser xortê li hundir de qêriya û got:

— Himm... Bêhna mirovan tê pozê min kurê min; ka zû ji min re bêje ev mirov kî ye û li ko ye? Ka bîne ko ez hû bikim ser û bê giyan bikim û daqurtînim, zikê xwe têr bikim û li ser têr xew bikim!’

Xort hat li pêşberî dayika xwe rawestiya û dest bi sondxwarinan kir û got:
— Bi hêz û sêhra dapîr û bapîrên xwe sond dixwim ko lingê ti mirovan li vî hundirî li ser erdê nîne û ti mirov di vî hundirî de nînin!

Lê Dapîra Mîrê Cinan, ji sonda kurê xwe bawer nekir û li derdora xwe çû û hat û nav di xwe de da û got:

— Hey mirovê/a mirov; tu kî bî û li ko bî zû derkeve û were hizûra min, xwe biavêje ber lingê min ko ez te bibexşînim. Ez dapîra mîrê cinan im ko gaveke min li erdê, gaveke min li ezmanan e; ez Dapîra Mîrê Cinan im ko di şevê de dikarim qesr û qonaxan ava bikim û hilweşînim. Ez Dapîra Mîrê Cinan im ko dikarim avên kaniyan biçikînim û ji guhanên pezan xwînê biherikînim. Ez Dapîra Mîrê Cinan im ko dikarim erd û ezmanan tije ewrên reş bikim û cîhanê li mirovan tarî bikim. Ez Dapîra Mîrê Cinan im ko mirovê bi ya min neke, xwe di heft denan de jî veşêre, dikarim derxim û hû bikim ser, wê/wî di cih de bêruh bikim û bi gepekê daqurtînim ji xwe re bikim şîv û li ser têr xew bikim. De ka tu kî yî û li ko yî, ji min re bêje û derkeve derve ko hîn min tu bi destê xwe dernexistiye û hû nekiriye ser ruyê te!

Ro di hundirê heft denan de wiha dilerizî û diranên wê wiha li hev dişerqîyan ko dengê lerizîn û şerqîniyê den di cihê xwe de dilerizandin. Heta hêz tê de hebû bi diranên xwe, lêvên xwe gez kirin û her du destên xwe li ser devê xwe gihand hev ko liv û deng jê çênebe û Dapîra Mîrê Cinan çiqasî nav di xwe de da, wê yek devik jî ji devikên denan bilind nekir û derneket derve.

Dema Dapîra Mîrê Cinan dît ko kesek dernakeve derve; vê carê dîsa xwe hilavêt û her du guhanên xwe yên bi erdê re dikişkişîn avêtin ser milên xwe û qûn da erdê û dest bi sozdayînan kir û got:

— Tu kî bî û li ko derê xwe vaşartibî zanibe ko ez Dapîra Mîrê Cinan im; ez xwediyê rehm û xêran im. Ez Dapîra Mîrê Cinan im; xwedî hêza herikîna kanî û çeman im. Ez ew im ko dikarim evîndaran bigihînim hevûdu û dilên bi hesret şa bikim. Ez ew im ko dikarim rêkên dûr nêzîk, çolên bej têr av, dilên bi kul têr derman bikim. Ez ew im ko mirova/ê bikeve mala min destvala venagerînim û çî miradê wê/wî hebe di cih de pêk tînim. Tu kî bî, li ko bî derkeve û were pêşberî min û lêborîna xwe ji min bixwaze ko ez te azad bikim û bi rêka te de rêbikim! Ger tu bi xwe dernekevî, tu xwe di hundirê heft denan de jî veşêrî, ezê te derxînim û hû bikim ser te ko tu di cih de bê giyan bimînî û te bikim gepek û daqurtînim ko ji xwe re bikim şîv û li ser têr xew bikim!

Ro careke din di hundirê denan de lerizî û veciniqî; her du destên xwe bi ser devê xwe de dewisand û li cihê xwe rawestiya û guh neda sozdayînen Dapîra Mîrê Cinan!

Dapîra Mîrê Cinan dema dît ko dîsa kesek derneket derve, vê carê pala xwe da erdê û pişta xwe da deriyê şikeftê û got:

Tu kî bî, li ko bî; li gorî ko tu ne ji çavtirsandinên min tirsîya, ne jî bawerî bi sozdayînen min anî û derneketî derve, diyar e tu keseke/î bi hiş û dil î! De ka derkeve derve, ez Dapîra Mîrê Cinan im; bextê min ji te re ko tu derkevî derve, ez tişteki bi te nekim û çî daxwaza te hebe bi cih bînim.

Lê Ro hemû gotinên hevalê xwe anî bîra xwe û dîsa dengê xwe nekir; bes bi dizî û bi hêdî yek bi yek devikên denan bilind kirin û derket derve. Ji paş ve xwe nêzî Dapîra Mîrê Cinan kir û guhaneke wê ya di ser milê xwe re avêtibû nava pişta xwe, girt û xist devê xwe û pê re heta hêza wê hebû bi diranên xwe givaşt û dest bi mêtinê kir!

Dapîra Mîrê Cinan bi girtin û gezkirina guhanê wê bi carekê re veciniqî û ji cihê xwe rabû xwe hilavêt jorê û xwe li erdê xist. Xwe bi vî alî û vî alî de avêt û xwest ko ji vê mirova li ser pişta wê ya guhanê wê xistiye devê xwe xelas bike. Lê çi kir û nekir mirovê guhanê wê berneda!

Dawî Dapîra Mîrê Cinan rawestiya û got; ‘Tu kî bî û ji ko hatibî ka dakeve xwarê, bextê min ji te re; were hizûra min û daxwaza xwe ji min re bêje.’ Wê demê Ro guhanê Dapîra Mîrê Cinan berda û daket xwarê! Dapîrê Ro û kurê xwe danîn pêşberî xwe û ji wana re got:

— Min dizanîbû ko wê rojekê ev qeda were serê min û kurê min dil bikeve mirovekê û ji min veqete! Ji bo wê dema te li ser banê qesrê veşareya kurê min eşkere kir, min ew kir çûkek û anî cem xwe ko xizmeta min bike û te jibîr bike. Lê tu nesekinî û bi heft çarox û heft gopalên hesinî bi pey evîna xwe ketî û heta te nedît, tu ne li ber sar û seqemê, ne jî li ber germahiya çol û cebelan nerawestiyayî. Ev jî diyar dike ko evîna we ji dil e û tiştêkî ji niha û pêve ez bikim û bikevim navbera we nîne. Evîndarê te kurê min e û mîrê tevahiya cinên vê dinyayê ye! Ji nava mîran keça kîjan mîrî bixwesta minê di wê bêhnê de jê re biguhezta; lê wî dil berda te û ji bo bigihêje te, min ew di nava du qalikên zebeşan de li mala Sarê ya jina Gavanê li welatê di navbera du gol û du çeman de anî dinyê. Ew kurê Dapîra Mîrê Cinan e ko xwediyê sêhr û huneran e. Lê madem hûn dixwazin dîsa vegerin ser xaka dê û dapîrên xwe û wekî mirovan di nava mirovan de bijîn, wê demê kurê min jî weke te dibe mirov û hemû sêhr û hunera wî ya ji cinitiyê tê wê betal bibe û ew jî wekî mirovekê wê jiyana xwe bi ked û xwêhdana xwe bidest bixe. Ger hûn vê yekê dipejirînin ezê destûra we bidim ko hûn vegerin ser xaka xwe!

Kurê Dapîra Mîrê Cinan destê xwe danî ser destê evîna xwe Ro û ji dayika xwe re got;

— Dayê, hîn dema te ez nexistibûm navbera du qalikên zebeş û li mala gavên neanîbûm ruyê dinyê; min xweşikbûn û bedewbûna Ro dîtibû û ne bi dilekî bi heft dilan dil ketibûm bejn û bala wê! Ne ko ez ji sêhr û hunera xwe dûr bikevim, ne ko ez ji cinitî û cîhana cinan veqetim; ger laşê min qet qet ji hev vekin û her qetekî rêbikin seriyekî dinyê, dîsa jî ez terka hezkirin û dilketina Royê bernadim û ji bo xatirê jiyankirina bi wê re ez amade me bibim mirovek û di nava mirovan de wekî mirovan bi keda destê xwe û xwêhdana eniya xwe bijîm.

Li ser vê yekê Dapîra Mîrê Cinan kurê xwe û Ro hembêz kir û rondik bi ser wan de barandin. Wê şevê heta berya berbangê ew di hembêza xwe de dan xewkirin û bêhna wana kişand hinava dilê xwe. Sibê, bi berbangê re ji xew hişyar bû û Ro û kurê xwe ji xew rakir û axaftina xwe ya dawî bi wana re kir û got:

— Ji qasî ko tu bû çûkek û firiya hatî gel min û Ro bi pey te ket, li ser xaka dapîr û bapîrên Ro, her ewrên reş û tarî hene û her ji kaniyên wan heriya sor û ji guhanên pezên wana xwîn diherike. Ji wê rojê û vir ve, li ser wê xakê ne keçan şû kiriye, ne zava bi ciwaniya xwe şa bûne û ne jî dayikan zarok anîne ruyê dinyê. Darên wan ên fêkî hişk bûne, giyayên wan zer bûne, heywan û ajalên wana tev stewr bûne û her yek kunêr û bîrovek di laşê wana de vebûne ko heft bijîjkên ji heft welatan anîne, dîsa nikarîne derman bikin. Sedem tev veqetîna we evîndaran ji hev bû; lê niha hûnê bi destê hev bigrin û veqerin ser xaka welatê di navbera du gol û du çeman de. Dema hûn bigihêjin tixûbên xaka welatê Ro, wê li wê derê jiyan ji nû ve bizê! Ji bo wê kurê min ez di nava mirovan de navê te datînim Zê ko her tiştê li wî welatî ziwa û stewr bûye ji kerema evîna we re ji nû ve şîn were û bizê.

Zanibe ko Zê navekî bi qedr û bi qiymet e! Ger zê tinebe wê Rok çawa bizê û ronahiya xwe bide ser xwezayê ko ins û cins rengan ji hev binasin, derûdora xwe bibînin û dil bikevin xweşikbûna hev!?

Ger zê tinebe wê çawa kanî û robar bizên ko bi avên xwe erd û mêrgan şîn bikin û jiyane bidin reh û qurmên daran û hemû teamên cîhanê biberhimînin!?

Ger zê tinebe wê çawa hemû ajalên dinyê bikaribin çêlîkan bizên ko nifşên xwe bidomînin û ji hezarên salan û vir ve werin û bi hezarên salan û wir ve biçin?!

Ger zê tinebe çawa dayik wê zarokên weke we xweşik û spehî bizên û dil bikevin hev û bi hev re jiyane biafirînin?!

Ji bo vê ez navê te di nava mirovan de datînim Zê ko tu Bi Ro re zayîneke nû ji welatê mirovan re bibî û bi ghiştina we ya ser xaka welatê xwe; ji guhanên pez şîrê spî, ji kaniyan ava spehî biherike! Dar û berên hişk şîn bibin û fêkiyan biberhimînin. Ajalên stewr tev cote cot çêlîkan bizên û jinên li hêviya zarokan bigihêjin miradê xwe. Careke din li ser xaka welatê we Ro hil bibe û kêf û şahî dest pê bike!

Dapîra Mîrê Cinan her du zaroyên xwe careke din bi kelegirî himbêz kirin û bi wana re heta ber deriyê şikeftê hat. Kevirê reş ê li ber devê deriyê şikeftê bilind kir û ew derbasî derve kirin. Careke din vegeriya şikefta xwe û bi halê xwe giriya, heta ko rondik hew ji çavên wê bariyan...

Li welatê Royê, ji roja xatir ji malbata xwe xwestibû û bi rê ketibû kesekî xêr û xweşî nedîtibû û her di nava şîn û nexweşiyê de bûn. Ji wê rojê û vir ve dema pezê xwe didotin ji guhanan xwîn, dema şerbikên xwe didan ber kaniyan ava sor diherikî...

Wê rojê li ser tixûbê welatê di navbera du gol û du çeman de dîsa şivan li bêriyê pez kom kiribûn û bêrîvan hatibûn ji guhanan şîrê bûye xwîn

didotin. Ji wana bêrîvanek dema guhanê pezê di dest de givaşt, dît ko mizek ji şîrê pez spî herikî! Mizeke din dot û dîsa dît ko spî diherike. Di cih de berdoşa di dest de avêt erdê û bi lez ber bi qesr û qonaxa padîşah ve reviya. Dema bi bêhneke çikiyayî ghişt qesrê û diyar kir ko mizginiyek ji padîşah re aniye, di cih de derî li ber vekirin û ew hewandin hizûra padîşah. Ji xwe ji roja keça wî derketibû xerîbiyê padîşah ferman dabû ko kî were ber deriyê qesrê û mizginiyê jê re bîne, di cih de deriyên li ber vekin û bînin dîwana wî.

Bêrîvan bi lez gotinên xwe li pey hev rêz kirin û li ber bêriyê çawa şîr didot û çawa bi carekê re dît ko ji guhanê pez ne xwîn, şîrê spî diherike, nuqutiye dilê wê ko keça padîşah Ro û hevalê wê yê jiyanê Zebeşo vegeyane ser xaka welatê xwe û ji bo vê mizginiyê bide, pezê xwe li bêriyê hiştiye û hatiye hizûra padîşah ko xelata xwe ya padîşah soz dabû bigre.

Li ser vê yekê padîşah bang li wezîrê xwe kir û ferman da ko bi lezgînî desteyek siwarî amade bikin û bi aliyê bêrîvan qalê dike ve bi rê bikevin û keça wî û zavayê wî pêşwazî bikin.

Hîn ew wiha diaxiftin ko li ezmanê welatê di navbera du gol û du çeman de, bi carekê re ewrên reş û tarî belav bûn û tîrêjên rojê di derî û şibakeyên qesrê re xwe dirêjî hundir kirin. Keç û jinên cer û şerbikên wan di destên wan de li ber kaniyê rawestiyabûn, ji nivşkê ve dîtin ko ji kaniyê êdî ne heriya sor, ava spehî û zelal herikî û bi coş û şahî destê xwe birin ber û bi hesreta heft sal û heft rojan têr av vexwarin.

Di wê rojê de hemû dayikên heft sal in bi ducaniyê li hêviya zayinê bûn, zarokên xwe anîn ruyê dinyê. Hemû ajalên stewr bibûn, zan û çêlikên cêwî anîn. Kat û pelên daran careke din hişîn bûn û berhemên bi tam dan...

Ber bi êvarî re desteya leşkerên bi rê ketibûn li gel Ro û hevalê wê yê jiyane vejeriyan bajêr û li ber deriyê bajêr, Padîşah, wezîr û heyeta şewirmendan û gelheya bajêr ew bi kêf û şahî, bi çepik û tililiyan pêşwazî kirin. Padîşah ferman da ko şîna heft sal û heft roj in tê kişandin rabe û def û dîlan lidar bikeve ko kî dilê wî di kê de be, bi daweteke çel roj û çel şevan tev şû bikin û bi hev şa bibin!

Careke din dîlan û govend li dar xistin û keça padîşah Ro û kurê mîrê cinan Zê di daweteke çel roj û çel şevan domiya de ghiştin miradê dilê xwe. Gelheya bajêr careke din ghişt jiyana xwe ya asayî û baxçe û bistanên xwe, pez û dawarên xwe yê berhemdar.

Padîşah û malbata wî ghiştin keça xwe û bûn xwediye zavayekî bedew. Gavan û jina wî Sarê êdî bi dilekî rehet dikarîbûn bihatana gel hev; ji ber ko ji roja kurê Sarê û bûka wê ji malê terikî bûn, Sarê livînên xwe li gavên herimandibû. Bi hatina kurê wan û bûka wan ew jî careke din ghiştin hev û miradê dilê xwe!

Ro û Zê piştî daweta wan a çel roj û çel şevan hatin xaniyê dê û bavê xwe û di nava mirovan de qasî temenê mirovan bi hezkirin û dilşadî û bi keda û xwêhdana xwe, jiyana kirin...

Nivîskar: HESEN HUSEYÎN DENÎZ

Weşandin: 2006-12-12

Xwendin: 12445

**

Gunehkar

» Enwer Karahan STOCKHOLM, 20/11 2007 — Temenê min çend bû, ez nizanim, lê rîh û simbelên min hîna nuh didan der. Dêya min nema serê min dişuşt, ji ber ko êdî berzika min jî reş bûbû. Ez ne xort û ne jî

zarok bûm, xortik bûm. Gah li kuçeyê di nav zarokan de bi lîstina şaqûlê ve mijûl dibûm û gah jî li ser rêya mizgeftê bi çindik û lotik bûm da bigêjim ser limêja esir û muxurbeyê. Gah bi destmêj bûm û gah jî şeytanpêkeniyayî bûm. Hîna zirnepixîn û arê di nav lingên qîzên meheleyê de ko pêsrên wan belbûyî bûn ji bona min di navbera lîstok û marîfeteke mêraniya ji zirtolîyê wêdetir bû. Ne ker û dahşikên li beyaran û ne jî qereçiyên ko di ronkahiya rojê de li parsê digeriyan ko pêsrên wan heta bi nêvî di beskurên wan de derketî bûn û ne jî dêlkillirin û comerdiya cîrana me ji bona min îfadeya tiştêkî bû. Bi tenê, peydarbûna hovîtiya bizaveke nediyar li nav rahnên min radibû ko xwe li bedena min a naşî radipêça û wê gavê arekî êzingên mazî di hinavên min de vêdiket ko li quncikên xalî, di her hênkahiyeye êvarên havînên me de dibû destpêka teqîna volqanekê.

Ez hîna nuh ji nav bêcemeyê serxetan, ji qutikê zer-tûrincî û sola lastîkî filîtî bûm û li kincên qumaşên ûtîkirî hay bûbûm ko ji destên wê nazika bajarî di pêşengeha bedena min de xwe li laşê min “zamoteyî” radipêça. Ew jineke bajarî bû ko ne li gora tu urf û adetên me bû. Ne zimanê wê û ne jî rabûn û rûniştin û tevgerên wê wek yên me bûn. Her gotineke wê bi ken û paşgotiniyê, bi qerf û mituqulkan dihat îfadekirin û tekirme û fisgenîtî lê dibariyan. Tu nedima ko ahlên me wê şemokî rabikin, wê bi çol û çepelan bixin û dûvik û tenekeyan bi dû wê ve bizeliqînin. Ne tu kes li xwarinçêkirina wê ya bedew hay dibû û ne jî kesî guh dida qahweçêkirina wê ya ji marîfeta şahbanûyan ko kef di ser qiraxê ferfûriyên fincanan re diherikî; ne kes li arê di bedena wê ya ciwan de hay dibû ko di bin wî kalemêrî de ditemisî û ne jî li his û daxwazên wê yên melûlî; bi tenê li çêkirina wê ya nexşên sor û şîhn hay dibûn. Ne kes li xwendina wê ya kitêbên edebî hay dibû û ne jî li xwendina rojnameyan, li kovarên magazîn û sporê, li temaşekirina filîmên sînemayê –ji xwe ji

bona çûyina sînemayê, ew di nav cîranan de bûbû mîna tîtirmokan- û ne jî di rojên germa havînê de, teva derpîkê kinik û pîsîrdankan ketina ava di birkê de...

Ew mîna meymûneke ko ji qefesa xwe reviyayî, hirçeke hovî û karxezaleke kovî dihat xuya kirin. Ji ber ko ew "bajarî" bû.

Ji ber tirsê mêrê wê bû ko kesî bi eşkereyî qal û bahsa wê nedikir, lê li pişt wê, hezar paşgotinî dihatin kirin.

Ez mîna destmala li ser destan bûm, gava ko wê ez dişandim kirîna tayê nexşan, derzî û tixikan. Em kirêdarên wan bûn. Ew jin û mêrên kurdûnde bûn. Navê wê ne mesele ye. Bi kinayî, ew mêkewek bû ko ji xwediyê xwe hatibû kirîn.

Ez li ber destê wê mîna çipskî bûm. Dê û bavê min ez ji bona suxreyên wan şîret kirbûm û ji xwe min jî ne bi tenê ji ber temiya wan, lê ji ber bexîşên ko yextiyarê mêrê wê didan min, her tim bi daxwaz û hirs bûm ko weke guhê li ser gazyê bûm. Ji bilî yek qurîşên ko wê didan min, mêrê wê jî di ber re bêrîkên min germ dikirin ko ez yeka jinikê nekim dudu.

Ev emrê îlahî ye, çî ye, mirov nizane, lê rojekê ko mêrê wê di ser limêjê de bû, ji nişka ve li ser hêla xwe ya çepê ket û nema ruh pê ve vegeriya; wî emir da haziran...

"Xanimê" xwe li ser wî peritand. Ne por bi xwe ve hişt û ne bisk û gulî, ne xwarin -bi rojan- bi devê wê bû û ne jî vexwarin, ne xwe şûşt û ne jî veşûşt, ne destmêj û ne jî taret girt, ne ket "kincan" û ne bi cinûbet bû. Wê li ser mirina mêrê xwe reş girêda û çavên wê tu tiştêkî dinê nedît. Wê berê xwe ji cîran û civatê guhert û serê xwe ji ser şûjdeyê ranekir, tizbiya nodûnehlîbî ji destan neket.

Wê êdî ne tej çêkirin û ne jî nexş, ne porê xwe hine kir û ne jî lêvên xwe sor kirin...

Ez jî êdî di ber wê re dibihurîm û ji bona wê mîna xerîb û rêwiyekî nenas bûm. Min jî ne ew di serşuştinên xwe de dianî ber çavên xwe ko ez li xwe xweş bînim û ne jî derbasbûnên wê yên di destê sibehê de bala min dikişandin ko ez li kulîmek û paşilên wê binêrim û bi xeyalên xwe re şerî bikim. Ez ne li wan şevên ko mêrê wê nelimalê bû difikirîm û ne jî li wan kêlîkên hanê difikirîm ko wê bi destên xwe ez şût î tahzî dikirim, ji serê tiliyên min yên ligan bi bedena min a tahzî ve -mîna tîrmarekê- radipelikî û bi zimanê xwe çîp û paqên min dialastin ko di orteya herdu hêtên min de li kelemekî dialiqî û dibû hewar û gaziya wê da ez ji merhemeta xwe varqilim û hêdîka devê wê ji cemedada agirê di navbera du şeqeloran derbixim ko tu nedima ew di devê wê de biheliyaya. Lêvên wê di navbera qeşa û agirê de diricifîn ko mîna li bende lêxistina sîleyake tobeyê be, nedixwest ji îbadeta xwe ya wê gavê veqete. Bêyî ko çavên xwe veke, bi dev û lepan laşê min ê di navbera zaroktî û xortaniyê de dipeland ko pirçikê nuh lê dabû der, di devê wê de dibû mîna şekirê pemboyî. Wê du rûkeet-ferz û sê sunetên îlahî li ser sînga min tamam dikirin ko ew ji bona wê dibû şujdeyê ji livaya eyarê milayket û horiyân.

Wê sê meh û huvdeh rojan bi wê sedeqatê li ber xwe da û di dawiya dawiyê de nema xwe girt. Dibe ko ev ne sûcê wê be, sûcê min bi xwe be ko min ew rûyê xwe yê ko ji rengê çaruxê ye avêt ser wê...

Wê xwe li himamokê dişuşt ko min li deriyê wê xistibû. Ez muxdarekî weha li ber deriyê sekinîbûm ko hetanî wê avek bi ser xwe dakiribû û teva kirasê binî hatibû derî li min vekiribû. Gava ko derî vebûbû, ji tîna laşê wê û ji bîhna parfumê, jixweber daxwaza vexwarina agirekî xwe li laşê min pêça bû û hema bêyî ew bibêje ko derbasî hundir bibe, min xwe li devê deriyê qewimandibû û min xwe li ser kursiya ber deriyê bera xwarê dabû. Şilbûna porê wê û penbebûna laşê wê zilamtiya min –yan jî xortikiya min- di hêlîna xwe de hilnehatibû, dev û diranên min li hev ketibûn gava ko

min jê pirsî bû bê tu kar û îşekî wê bi min heyê da ez bi cîh bînim, yan na? û wê jî derhal ew tiştê ko di nav lingên min de belbûyî ferq kiribû, tê derxistibû ko tu karê min bi wê tune ye, bi tenê ew daxwazeke ko nema di can û cesedê naşîtiya min de hiltê û hema bêyî ko em tiştê bibêjin, ling û dest, zik û berzik û lêv û lapûr ber bi hev ve bezikî bûn. Destek ji herçar destan çûbû ser bişkoka lampeyê û ji bîst tiliyan tiliyekê şev reş kiribû. Bedenên me xwe li hev pêça bû û zêdayiyên laşê min di kort û newalên canê wê yê sipî-boz û nerm de, çikiya bûn. Ez li ser defa sînga wê bûbûm mîna zîhayekî, di her hilatin û dahatineke de teşkên min li ser bedena wê dibûn qarmîçe û hezîran. Şirîna xwêdanê bi bedenên tazî ve diherikî ko qirş û qal ber bi wê lehiyê diketin, li qerexa newalekê digewimî û bi pêleke mezin re diteqiya. Ne kevir û kuçikan û ne jî tu dar û devî û benan xwe li ber wî çemê şîr û şerbetê digirt.

Em herdu jî mudetekê weha bêdeng li teniştê hevdu bi awayekî ramedandî diman. Ne deng ji min dihat û ne jî ji wê. Bi tenê dengê dilopên li pey firtoneyeke li dû babîsokan dinuqutî.

Loşbûyina lampeyên kuçeyê di pişt perdeyan re diyar dikir ko êdî av li agirê bedenên gunehkaran bûne û xwêdaneke mezeloqî bi zorê wan ji hevdu diqetîne. Keser û bîhnvedanên wê, hênkahiya surra bîhna wê û gupegupa ser dilê wê careke dinê ez har dikirim ko tiştê ji bedena min a xortikiyê mîna hûtekî radibû ser xwe. Tiliya min a eşihedê diket devê wê û çonga min di nav lingên wê de, li cîhê ko şilûpilbûyî mexel dihat. Ay û ûyên wê, xiroş û piroşên min û wê, di dîwarên odeyê de olan didan û li me vedigeriyan. Heta ko ew deng digîhaştin me, dengên nuh dest pê dikirin û vê carê dengê notayên wan têlan, melodî û perde diguhertin. Ne dengê keman û qanûnê û ne jî yê ribab û bilûrê, ne yê çelo û biziqê û ne jî yê ûd û cumbuşê bala me belav dikir; ew dibûn tempoyeke ji ahenga reqsa ecuneyan, dibû îlahiyeke ji îbadeta me ya wê bîstikê, heta ko

girmîniya dengê gopalê defa daholvanekî çevnexelî derdiket; wê gavê êdî ne ew yeke jinebîh bû û ne jî ez xortikekî naşî bûm; me herduyan jî xwe mîna "gunehkarên" melûl his dikir.

Meha 12yan, sala 2006an

Not: Ev çîrok di hejmara yekê ya Çirûskê de belav bûye.

Nivîskar: ENWER KARAHAN enwerkarahan@hotmail.com

Weşandin: 2007-11-21

Xwendin: 11670

**

Êş

»Xwezî anuha ev gotinên min bihatana nivisandin!

Xwezî di pirtûkekê de berhev bibûyana!

Bi pênuşeke hesinî, bi qurşûnê

Li zinaran bihatana kolanê ko her û her bimana.«

(»Tewrat«, Hz. Eyûb, XIX: 23–24)

Prolog

Ji bo ko ev çîroka ha were nivisandin, wî bi bêjîngan titûn ne kişand, bi kûpan şerabên kevnesalan venexwar, gund bi gund ne geriya û mijar berhev ne kirin, bi dehsalan li ser ne sekinî û lê hûr ne bû, wekî mirîdan çavên xwe ne girtin û guhdariya aliman ne kir, li civatên eşîran rûneniş tizbî di nava tiliyên xwe de li ba ne kir û mîna dengbêjan ne lorand. Bi gotineke din, Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê serpêhatiyê ev çîroka ha ne nivisand. (Wêne: Hesenê Metê)

Û wê şevê, dema ko wî qelûna pêşîn ji titûnê dagirt, dema ko agir berdayê û dûman bi ser xist, ko ez ne li ba wî bûyama, a di wê gavê de ko ez ne bi wî re bûyama, bi du hezar û du caran ez sond dixwim ko anuha ev çîroka ê ne di destê we de bûya.

Lê dîsa jî, dîsa jî ez dizanim ko kesek ê bi van gotinan bawer neke lê... wek ko min got, di wê gavê de li ba wî deng tune bû, ronahî tune bû, wext tune bû, Xwedê tune bû, dunya li dora xwe çerx ne dibû.

Û ev hat malê.

Monolog

M aleke weke gelek malên bêyî jin û zarok e. Ji ode û aşxaneyêke piçûk pêk hatiye. Ji dîwarên vê odê, dîwarê hember bi çend refikên pirtûkxanê hatiye nixumandin û di ser pirtûkxanê re jî portrekî Ahmedê Xanî dardakirî ye. Li dîwarê hêla rastê jî portrekî mîr Celadet Alî Bedirxan ji profîlekî çepê ve hatiye dardakirin ko çav û awurên wî li pirtûkên refikan e. Li rasta odê, di navîna du sandaliyan de maseyêke piçûk heye. Çend name û rojnamên ko diyar e hîn venebûne, qelûneke xwar û kevnar tev lepek titûna raxistî li ber kêsekî dermanan li ser vê masa rasta odê ne. Li quncikekî jî maseyêke karê nivisandinê bi pênûs, bi defter, bi makîne û bi gelek tiştên weke van tiştan dixuye.

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê tev salên xwe î çelî, tev potîn û qapûtê xwe î payizî anuha li ber vê masê rûniştiye. Ji vê tevgirêdana wî jî baş diyar dibe ko hîn nû ji derve hatiye. Bi hêrseke vekirî, bi daxwazeke wusa veşartî makîne tilî dike û dikute ko meriv dibêje qeyê li ber berhemeke giran rûniştiye, meriv dibêje ji bo hemû dewr û dewranan dinivîsîne, meriv dibêje herkes ê rabe ji xwe re lezet û maneyekê jê derxe. Lê na, piştî rêzekê duduyan kaxizê ji ber devê makîne derdixe, lê dinêre, bi hêrseke bilindtir di nava destê xwe de diguvişîne û wê jî davêje selika kêleka xwe. Piştî çend carên weha çeqîn û çilpîna makîne hêdî hêdî giran dibe, tenik dibe û deng jê tê birîn. Selika li kêleka wî ji kaxizên guvişandî tije dibe û di dawiya dawîn de wan tiliyên xwe yê bi huner dide ber eniya xwe, di ser makîne de xwar dibe û diponije.

Bi qasî çend hilman bi vê rewşê dimîne, dû re ji nişka ve serê xwe radike, pêşiyê bi tirs û paşê jî bi hêrs ji ser sandaliyê radibe, makîna xwe radike û li erdê dixê. Mîna yekî har û çavsor vê carê bi nefrîn li dora xwe dinêre û di wê gavê de ew çavên sor li portrê mîr asê dibin. Bi wê hêrsê, bi wê tirsê ji nişka ve xwe radikêşe portre, ji dîwêr dadixê, di destxwe de lê dinêre, mîna ko pê henekan bike devê xwe jî lê xwaromaro dike "Zilamek û zimanek"(*) dibêje, dengê xwe berztir dike û di ser de diqêre:

— Ev çi rê bû te da ber xelkê, mîrê min, ev çi ilm û îrfan bû! Xwendin û nivisandina bavê min tune bû... di dema wan de dunya ne gilover bû, di dema wan de dunya li dora xwe ne dizivirî lê... lê dîsa jî bextiyar bûn!

Bi van gotinên xwe re dest û lêv lê dilerizin, çavên wî di kortalên xwe de dilîzikin, portrê mîrê xwe li erdê xweş dike û dike ko wî jî weke makîna xwe li erdê bide. Lê tavalê poşmaniyekê digire ser, hêrsa wî dibe diltenikiyek û li ruhê wî belav dibe. Mîna ko doza lêborînê jê bike vê carê jî portrê mîr dide ber ruyê xwe, bi xemgînî û çavên avî bi ciyê berê ve dizeliqîne, bi rewşeke jihevketî sandaliyê li xwe diguhere û tê li ber masa rasta odê cî dide xwe.

— Nabe, mîrê min, nabe... ne bi sitran û ne jî bi gotinan, dibêje, herdu destên xwe ber bi perçên makîna xwe dike û bi bêhneke feretir û bi dengê nermtir dîsa didomîne: Her cara ko ez li ber vê kambaxê rûdinim, tu dibêjî qeyê ez li ber kewara mozan rûniştîme, mîrê min, ez dibêm qeyê ez bi dengê bilind derewan dikim û herkes jî dibîne, herkes dibîne û guhdariya min dike. A wê çaxê jî... wê çaxê jî bêhna min teng dibe, mejî li min ditevize, dest li min giran dibe, şerm, tirs û hêrs li min peyda dibe û ez nikanim. De ka ji bona Xwedê tu riyekê bide ber min, mîrê min... xelk çawa dinivisînin, çima ew hîkmet û ew cesaret li ba min tune?

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê qelûna xwe ji titûna raxistî dadigire, agir dike, dûmanê bi ser xwe dixê û giran giran dibêje:

— Ez dizanim, mîrê min... ez dizanim anuha tu ê mereq bikî û bibêjî: tu çima dixwazî binivisînî, te çima dest bi vî karî kiriye? Pirseke weha, rasterast pirseke weke vê pirsê cenabê te min jî ji yekî wekî xwe kir. De îcar tu dizanî ka bê bersiv çî bû, mîrê min? Digot:

«— Min dest bi pirtûkekê kir ko ez bixwînim. Piştî ko min pêşgotina pirtûkê xwend, hîs û baweriyê wusa li min peyda bû ko ez binivisînim, min jî êdî dest pê kir.» De îcar ji kerema xwe re destûrê bide min, ez ê anuha ji te re wan gotinên pêşîn bixwînim, mîrê min, gotinên ko tavilê merivan dike niviskar, dibêje, radibe ji refikekê pirtûkekê derdixe û li ser lingan dixwîne:

»Binivisîne! Îllam binivisîne! Şerm neke, netirse. Edebiyat xweş e, binivisîne!... Divê tu binivisînî. Nivisandin baş e. Çî dinivisînî binivisîne. Hemû tiştên nivisandî baş in. Li ser çî dinivisînî binivisîne. Ji ber ko hemû tişt ji bo nivisandinê hatine afirandin. Li ser nivisandina hevalê xwe binivisîne, pesinê dostê xwe bide, pesinê niviskariya wî bide. Divê em pesinê hev bidin, divê em pesinê hev bidin ko em bilind bibin. Pesin xemla mêran e...«

Li vir destê xwe li ba dike û bi tinaz, bi enirîn di ber xwe de: Bi qurbana mêrê xwe bim, dibêje, bi hêrs û dilverişîn tev wan gotinên pêşîn pirtûkê ber bi quncikekî odê davêje, hêdî hêdî qapût ji navmilên xwe dike, li aliyekî sandaliya xwe datîne, di rûniştinê de li portrê mîr jî dinêre û dibê: — Ev tiştên weha rasterast şîretên Ptahhoteps(*) in, mîrê min, te got çî? Çar hezar salan beriya nuha ciwamêr li ser çerm û keviran lîteratureke weha ava kir û xuyaye di wan deman de maneyê xwe jî hebûye. Lê ko tu ji min bipirsî, piştî evqas salan meriv rabe û di roja îroyîn de jî ji bo pêş û paşîya pitûkan gotinên bi vî rengî bibêje, meriv ê edebiyateke zorgayî peyda bike. Tenê edebiyateke zorgayî û ne tiştêkî din. Zorga dibêjim.... ilmê te fere, zimanê te xurt e, mîrê min. Li ba me dema ko nogin ji wexta

xwe dereng dikevin, em ji elêta mangeyeke biga tînin di dawa noginê re didin û paşê em conegan lê dicivînin. Li vir em wan conegan dixapînin û navê vî kerametî jî bi zimanê me gundiyan zorgayî ye, te got erê? De îcar anuha em vegerin ser pirsê te û nivisandina min. Ev çîrokek dirêj e, mîrê min, çawa bibêjim. Dibêjin ko tu keran li ba keran girêdî ji hev hînî tir û fisan dibin. Lê ez bi xwe ne li ba wan bûm, mîrê min, ez ne di nav wan de bûm. Û hîn jî ez û vî karê nivisandinê ji hev dûr in. Beriya ko daxwazeke weha li min çêbe... û ez ji mîrê xwe re bibêjim, daxwazeke weha jî tucarî li min çênebûye ko ez jî navekî niviskariyê bi pey xwe bixînim, pê bifirim û xwe bilind bikim. Bi gotineke rastir, beriya ko ji naçarî dest pê bikim û bixwazim binivisînim... (destê xwe ber bi wê selika kaxizên xwe dirêj dike) beriya ko ez bixwazim tiştêkî weha bikim, ez çel carî bi bapêşê ketim, ez çel carî bi zikêşê ketim, bi ewqas carên din lingên min şemitîn û ez li erdê ketim.

Li vir xwarî benê potînên xwe dibe, vedike, ji lingên xwe derdixe, li kêleka xwe datîne û di ber xwe de didomîne:

— Vêca... çima min xwe daye karekî weha, çima ez dixwazim binivisînim, ez ê anuha ji te re çîroka vê çîrokê bibêjim, mîrê min.

Dûmaneke tîr û tarî di dev û pozê xwe re dike der, bi awurên hişk li mîrê xwe dinêre û:

— Wê çaxê... di wan deman de cenabê te tune bû, dibêje, destê xwe ber bi hêla portrê Ahmedê Xanî bilind dike û didomîne:

— Cenabê seyda jî li vir tune bû.

Mîna yekî ko radest bibe vê carê herdu destên xwe bilind dike, serê xwe li rast û çepê xwe dizivirîne:

— Lê wekîdin hertişt, hertiştê vê malê wê çaxê jî... sê sal berê jî wekî xwe î anuha bû, dibêje, wan destên xwe li hev siwar dike, dide binê argûşa xwe, hinekî difikire, kesereke bêwext vedide û li gotinên xwe zêde dike:

Cenabê te jî dizane ko dûrketina ji mal û warekî bav û kalan çawa ye. Piştî êşa dûrketineke bi qasî şanzdeh salan ez û birayê xwe î mezin, em digêhîjin hev. Roj û êvar... dîsa roj û êvareke weke anuha ye, mîrê min.

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê bûyerê xwe li êşa hundurê xwe germ dike, hêdî hêdî dikeve ber û ji mîrê xwe re vedibêje:

— Piştî ewqas salên dûrûdirêj, bi qasî saetekê heye ko min birayê xwe î mezin dîtîye û min ew ji balafirgehê haniye mala xwe. Wek ko min got, mîrê min, mala min jî dîsa ev mala ye, ev ode û ev aşxana piçûk e. Di vê saeta ko ez û birayê xwe bi hev re ne, min jî weke herkesî li ser lingan tenê tiştên sivik û berborî jê pirsîne. Bi gotineke din wek çîrokbêjekî çikos ez dixwazim hindik hindik jê bipirsim û bi qasî bîst û yek rojan guhdariya wî bikim. Her cara ko ez li ser van tiştan difikirim, tiştên ko ez ê jê bipirsim û ew ê jî bibersivîne, pêjnên dûr û nêzîkî aqilan li min peyda dibin, wan bergehên beriya ewqas salan tînime pêş çavên xwe, bi dilekî tenik, bi bêrî û bi hezkirin ji hêla aşxanê dizivirim ser aliyê odê ko li birayê xwe î mezin binêrim û gotinekê jê bibîhisim. Birayê min li ber vê pirtûkxana oda min sekinîye, herdu destên xwe çeperast li ser sîngê xwe girêdane, bi kêf û mereqdarî li pirtûkên van refikan dinêre û dema ko hay ji min dibe, serê xwe jî bilind dike û bi qedir û qîmeteke bilind dibêje:

— Te pirtûxaneyeke dewlemend heye.

— Erê, dibêjim, ez jî yekî wusa me ko... çî pirtûk bi dest min bikeve ez ê bixwînim û dû re jî ez ê di dereke vê pirtûkxanê de bi cî bikim.

— Ev xwiyekî te î berê ye, Darîn. Wê çaxê jî te ji defter û pirtûkan hez dikir, hîn di wan deman de jî min têderdixist ko tiştêk ê ji te derkeve.

Em herdu jî bi qedrê hev dizanin. Ez qedrê wî dizanim ji bo ko ew birayê min î mezin e û ew jî... êdî Xwedê dizane bê ji ber çî rûmetê dide min. Birayê min destên xwe ji ber hev derdixe, destekî xwe ber bi hêleke pirtûkxanê dirêj dike û didomîne:

— Ev hêla bi tirkî ye, xuyaye ev hêla jî bi zimanê vir e...

Ji pirtûkxana xwe wan refik û aliyên mayî jî ez bi wî didime zanîn û dibêjimê:

— Ev aliya jî bi zimanê malê... bi kurdî ye, keko.

De îcar te ne dît lê di wê gavê de ez dibînim, mîrê min. Bi wê peyva kurdî re ez dibînim bê çawa çavên birayê min dibiriqin, çawa ken û kêf jê difûre û xwe bêtir ber bi wan refikên hêla kurdî dike. Yekê jê derdixe û bi dilpekîn çavên xwe di ser de mezin dike. Bi min wusa tê ko di wê gavê de lêdanên dilê wî xurt û zêdetir dibin û ez jî dibîhîsim, mîrê min.

— De kerem bike, keko, dibêjim... min nan û penîr daniye, tu kerem bike em tiştêkî bixwin û hêdî hêdî ji min re behsa wan deran bike.

Lê tiştên ko ez dibêjim kekê min nabihîse. Mîna yekî kwîr destê xwe jî di berga wê pirtûkê re dide û ez dibînim bê çawa pê şa dibe.

— Erê, dibêjim û didomînim, tu ê dû re ji xwe re yek bi yek lê mêze bikî û bixwînî... û ko te bivê hinekan jî bi xwe re bibe. Ma te xwe hînî xwendina kurdî kiriye, keko?

Birayê min leztir dike. Ji refikên pitûkxanê yekê derdixe, yekê dikiyê û bêyî ko li min binêre di ber xwe de dibêje:

— Na, ez hinek tîpan ji hev dernaxim... lê ne pêwîst e ko meriv bixwîne. Bi rastî jî hûn li van deran karên hêja dikin û ev têra me dike.

Bi serbilindiyeke veşartî di dilê xwe de dibêjim: «Çi maqûlên tégêhîştî û hêja ji mala me derketine.» Dû re ez wan gotinên xwe ducar dikim û dîsa dibêjim:

— De kerem bike, keko... kerem bike bila çaya me sar nebe.

Lê kekê min dîsa kerem nake, mîrê min. Ew her meşqûlî pirtûkan e û karê xwe dike. Yekê ji derekê dikişîne, lê dinêre û dîsa dixê şûna wê, yeke din derdixe dîsa wusa dike, yeke din û yeke din. Mîna ko li tiştêkî bigere li berg û rengên van pirtûkan dinêre. Ji kêfxweşiyekê lêvên wî dilerizin û li

ser hev direqisin, lê ez nizanim bê ji ber çi ye. Dû re bi pişirîn, bi hêvî, bi bextiyarî berê xwe bi min de dike û dibêje:

— Navê te î li vir çi ye, Darîn?

— Navê min, dibêjim, navê min î li vir jî Darîn e, keko.

Birayê min bi rûkenî, bi dilpekî vê carê herdu destên xwe jî ber bi refikên pirtûkxanê vedigire û dibêje:

— De ka tu bi xwe tiştêkî xwe derxîne ez lê binêrim, lo!

— Tiştê çi, keko?

— Pirtûk, pirtûkên ko te nivisandine.

Li vir ez pêşiyê hinekî sar dibim, dû re şerm dikim û Xwedê dizane di jiyana xwe de ev dibe cara pêşîn ko ez dikevime rewşeke wusa teng, mîrê min. Lê bêyî ko ez vê sar û şermê li xwe bidime der tavilê dibêjimê:

— Pirtûkên çi? Min pirtûk ne nivisandine ko... Ez nanivisînim, keko.

Ez dibînim ko bawerîya kekê min bi van gotinên min nayê, mîrê min, ez dibînim ko naxwaze pê bawer bike. Herdu çavên xwe ber bi min piçûk dike, dinêre û bi dengekî zuwa dibêje:

— De qeyê tu henekan dikî, lo!...

Lê ez bi awayekî bêguman pê didime zanîn ko ez henekan nakim, ev kara ji min nayê, dibêjim û dû re jê daxwaz dikim ko em li ber textê xwarinê rûnîn, ez jê daxwaz dikim ko ew têkeve ber û hêdî hêdî ji min re behsa wan deveran, behsa dê û bavê min, behsa malbata me bike. Lê ez dibînim bê di wê gavê de çawa ew dilpekî û rûkeniya bi gavekê berê li ser ruyê birayê min wenda dibe, mîrê min. Ez dibînim bê ew lêvên wî yên ko bi gavekê berê dilerizîn anuha çawa daketine. Bêdil û bi rewşeke jihevketî ber bi aşxanê tê û di ber xwe de dibêje:

— Ez ne birçî me.

Li ba me, mîrê min... li ba me dema ko meriv li mala yekî nan nexwe, tê wê manê ko meriv sil bûye. Lê bêyî ko ez vê tevgera wî eşkere bikim jê re dibêjim:

— Tu çawa ne birçî yî, keko? Ez dizanim we tenê di balafirê de nan xwariye û ew jî ji nîvro de ye, ne wusa?

— Nizanim, dibêje, lê anuha mîna ko tew dilê min naçe xwarinê.

— De kerem bike, keko, dibêjim, kerem bike em bi hev re bixwin û ji min re jî behs bike, behsa malbatê, çêlî eşîrê bike û bibêje ka kî miriye û kî maye.

Birayê min bi wê rewşa kêfrevîn:

— Na, dibêje, şikir ji Xwedê re tiştê wusa ne qewumiye ko tu pê xemgîn bikevî. Mala me jî û ez dikanim bibêjim hemû endamên eşîrê jî baş û silamet in. Lê çav û hêviya herkesî jî li te ye. Bavo... bavo digot, jê re bibêje bila me rûreş û şermesar dernexîne.

Bi van gotinên xwe re birayê min li ber textê xwarinê rûdine û bi mirûzekî tirş piyala çayê ber bi xwe dikêşe. Di wê gavê de gumanek li min jî çêdibe, mîrê min. Gumanek li min çêdibe ko hinek xêrnexwazan tiştina li hev hanîne û bi wan ragêhandine. An ne, ma bavê min ê çima bi min bide zanîn ko ez wan rûreş dernexînim. Bi mitûmatî li birayê xwe dinêrim û dibêjim:

— Ka raweste, keko, ev çi gotin e! Rûreşiya dê û bavê min gunehkariya herî dawîn e ko ez li vê dunyayê bikim. Ê dema ko ew gava jî were, divê ez êdî bimirim û viya dê û bavê min bi xwe jî dizanin. De ka anuha ji min re bibêje... ma ez ê çi bikim ko pê dê û bavê xwe rûreş derxînim, keko?

Birayê min bêdil çaya xwe li hev dixwe, bi min dide zanîn û dibêje:

— Dayê û bavo jî bi vê yekê dizanin. Loma... loma digotin hêviya me ji Darîn heye. Hêviya me heye ko ne tenê yek û dudu, ew ê gelean binivisîne.

Ez bi pirs, bi tirs lê dinêrim û dibêjim:

— Çi binivisîne?

— Pirtûkan, pirtûkên qelew binivisîne ko me jî û... wusa bike ko me jî û tevayiyê eşîrê jî pê serbilind bike.

Ku ez li xwe mikûr werim û bibêjim, ji van tevger û gotinên birayê xwe ez tişteki fam nakim û tişteki nakeve serê min, mîrê min. Birayê min ji bo min dibe kewareke devgirtî û nizanim bê çî tê de heye. Mitûmatiya min dikeve reneki din û jê re dibêjim.

— Na xwe ji bo vê yekê ye ko bavo gotiye: bila me rûreş dernexîne?

— Belê, dibêje, ma ev hindik e... bi îsrar digot: Jê re bibêje, heta nuha jî me nav û dengekî wî ne bihîstiye, digot bila ji me re bişîne, bila binivisîne, bila werîne.

Bi van gotinên wî re bêhna min tê ber min, mîrê min. Ew tirs û gumana naxosiyê ji ser min radibe, baweriyaya min li min xurtir dibe ko min tişteki naxos ne kiriye, min tişteki naxos ne kiriye û pê bavê xwe rûreş dernexistiye. Ji bo ko bêtir têbigêhîjim ka çîrok çî ye, ez bi mereqdarî jê re dibêjim:

— Birayê min î ezîz, ez têngêhîjim çima pirtûkan binivisînim, çima serê eşîran di ber pirtûkan de bilind dibin. Eşîrên ko ez dizanim ji bilî pirtûkên pîrozwer navê pirtûkan ne bihîstine û em hemû jî pê dizanin ko xwendina wan jî tuneye.

Mîna ko bi serhişkekî re bipeyive birayê min li vir destê xwe jî li ba dike û:

— Erê erê... dibêje, lê ne pêwîst e ko xwendina meriv hebe. Ez ji te re dibêjim, îro li ba me nivisandina pirtûkekê ji bo malbatekê serbilindî ye. Kêmasiyeke pir mezin e ko êdî ji malbatekê yek ranebe û pirtûkekê lêneke.

— Ya sitar, dibêjim.

— Belê, dibêje, apê Gurgîn digot, em li bendî Darîn in, em li bendî ne ko pirtûkek qelew binivisîne.

Ez dîsa zîq li çavên vî birayê xwe î mezin dinêrim û dibêjimê:

— Bi rastî jî ez têngêhîjim, keko.

— Çawa têngêhîjî, malava! Apê Gurgîn digot, em li bendî wî ne ko pirtûkekê, yeke qelew binivisîne.

Xwezî te apê min î Gurgîn bidîta, mîrê min, ko te ev apê min bidîta te ê baştir bi vê kula dilê min bizani bûya. Ez li birayê xwe vedigerînim û dibêjim:

— Baş e, lê tu çi dibêjî?

— Ez jî wusa dibêjim, dibêjim binivisîne û bila em ji xelkê ne kêmtir bin. Ne ez... ne tenê ez, meta Xanê jî digot jê re bibêje em li bendî wî ne, digot bila tev pirtûkên xwe ew jî were û ji me re, ji xelkê re behs bike.

De îcar... ko ez ji te re çêlî vê meta xwe bikim, çîrok ê pir dirêj bibe, mîrê min. Lê ko ez ji mîrê xwe re bi kurtî bibêjim, ev meta min ji herdu çavan jî kwîr e. Loma ez hinekî jî bi enirîn li nava çavên birayê xwe dinêrim û:

— Binêre, keko, dibêjim, tu birayê min î mezin û ronîya herdu çavên min î. Lê bi rastî jî ez têngêhîjim bê çima we karûbarên xwe berdane û hûn bi pey tiştên vala, bi pey pirtûk û nivisandinê ketine. ko we pere, mal û milk ji min bixwesta, ko we bixwesta ez jî nola hinekan bibim xwediyê mal, jin û zarokan... ez ê wê çaxê têbigêhîştama. Lê ez dinêrim ko tu hîn jî dibêjî pirtûk û binivisîne.

— Belê belê... wek ko min ji te re got, li welêt êdî xelk behsa pirtûkan dikan. Amoja bavfile digot: Ji Darîn re bibêje, ma bi qasî lawê mala Garût jî nabe. Lawê mala Garût hatiye, çêlî pirtûkan kiriye, çêlî niviskariya xwe kiriye, pesinê rûpelên pirtûkên xwe daye û gotiye: «Meriv li wan deveran pir baqil dibe.» Dayê jî li wir bûye. Dayê jî bihîstiye ko lawê mala Garût serî her rûpel û her pirtûkek xwe çiqas pere girtiye.

Li vir ez êdî dibînim bê birayê min çawa daye nav û dibêje. Ê ez serwextî tiştêkî din jî dibim, mîrê min. Serwext dibim ko bi rastî jî pirtûk û nivisandin bûye mijar û ketiye nava xelkê, bûye benîşt û di wan geriyaye. Lê dîsa jî ji bo ko zêdetir serê xwe di ber van tiştan de neyêşîne, ez li birayê xwe vedigerînim û jê re bi kurtî dibêjim:

— Binêre, keko... kî hatiye, çi gotiye, ew bi min û we ne ketiye. Niviskarî ne karê min e û tiştêkî weha jî ji min nexwazin. Wek ko min got, ko we pere ji min bixwesta, min ê biçûya deyn bikira... min ê biçûya bidiziya û ji we re bişanda. Lê nivisandin û pirtûk... meriv nikane van tiştan deyn bike, meriv nikane bidize jî. Ji min nayê, ez çi bikim...

Mîna ko ez bi van gotinên xwe gunehkariyekê dikim, birayê min zûzûka peyvê li min dibire û dibêje:

— Wusa mebêje, Darîn, çawa ji te nayê. Ji bona Xwedê me rûreş dernexîne. Bi Xwedê dayê digot jê re bibêje: ko ew pirtûkekê nenivisîne ez ê şîrê xwe lê helal nekim.

Ev cara pêşîn bû, mîrê min... cara pêşîn bû ko diya min şîrê xwe li min heram fikir. De îcar te diya min bidîta, mîrê min. Diya min a reben, diya min a şîrpak... dilovaniya diya duwanzdeh pêxemberan li ba diya min hebû, mîrê min... û wek ko tu dibînî anuha jî rabûye ji bo nivisandina pirtûkan şîrê xwe li min heram dike. Li ser van gotinên birayê xwe ez tiji dibim, sîng li min diwerime, dengê min bi hêrs bilind dibe û ez jê re dibêjim:

— Nivisandin çima dikeve navîna min û şîrê diya min! Ez û nivisandinê ji hev dûr in, tiştêkî wusa ji min nayê û ez nikanim.

Birayê min jî bi hêrseke qasî hêrsa min li min vedigerîne û dibêje:

— Çawa ji te nayê, Darîn! Mebêje ez nikanim, wexta ko tu li wir bûy, me digot merivekî mezin ê ji te derkeve. Xalê Berot digot jê re bibêje: Bila ji bîr neke ko şeref û hêviya me di destê Xwedê, di destê wî de ye. Bila ji bîr

neke dema ko dixwend, di her çûyîna bajêr de min li ber dîwarê dibistanê du panotên hesinî didayê... digot, bila ji bîr neke ko wê çaxê min ew panotên hesinî ji bo rojeke weha dida wî.

Mezinî... li ba me mezinî tişteki pîrozwer e, mîrê min. Em bi simbêleke nûkurkirî dernakevin pêş mezinekî xwe, li pêş mezinekî xwe nabe ko em titûnê bikêşin... (hilmeke dawîn ji titûnê dikêşe hundurê xwe û qelûnê di ser xwelîdankê de derxûm ditepîne) nabe em bi deng bikenin. Lê bi van gotinên wî re bêyî ko bibêjim ev birayê min î mezin e... li vir kenekî wusa ehmeqane bi min digire ko heta nuha jî li pêş mezinekî malê ez bi vî rengî û bi vî dengî ne keniame, mîrê min. Dû re li ruyê wî dinêrim:

— A ji te re, dibêjim, de were safî bike! Xuyaye tevayiya eşîra me gotinên xwe kirine yek û bi te re şandine vir.

Deng ji birayê min nayê. Ez bala xwe didimê ko di her hevok û gotineke min de gwînê wî bêtir divemire û rengê hêviyeke şikestî lê zelaltir dibe. Mîna ko ji xwîna bavê xwe vexwe, di her firek çayê de jî ez dibînim bê çiqasî bêdil e. Ez baş têdigêhîjim ko ev daxwaza wî û nivisandina min ji dilekî pak e. Ê ne tenê ev, dema ko ez jî ji dilê xwe î pak û bêhenek pê didime zanîn ko tişteki weha li dor min, li ber min tune, a wê çaxê... wê çaxê ez dibînim bê çawa parî di gewriya vî birayê min î mezin de dimîne, wek zarokekî ko ji gotinên bavê xwe bişikê pêşiyê çav lê şil dibin û dû re jî av jê tên. ko yekî din bergeheke weha ji min re bi du hezar û du sondan bigota, min ê dîsa jî bawer nekira, mîrê min. Di wê gavê de dilekî min pê dişewute, dilekî min jê hêrs dibe, dilekî min jî dibêje ka hûr hûr têkeve vê dunya wî û nas bike, nas bike ka bê çi dunyayeke seyr e. Ez jî wusa dikim, mîrê min. Ez bi gotina dilê xwe î dawîn dikim û vê carê bi bergerîn jê re dibêjim:

— Baş e, keko, ma ez ê bikanim çi binivisînim.

Bêyî ko kekê min li min binêre bi nermikên herdu zendên xwe ava çavên xwe paqij dike, ava pozê xwe dikişîne jor û di ber xwe de dibêje:

— Tu çi dikanî binivisîne, Darîn. Ez ketime bextê te û Xwedê! Tu çi dikî bike, çi dikanî binivisîne, lê min destvala neşîne malê.

Ez têderdixim ko li ba me, di nava eşîra me de babetê nivisandinê ne girîng e, lê dîsa jî ez xwe nadime ber vê yekê û dibêjimê:

— Ez nikanim tiştêkî binivisînim ku.

Birayê min bi wan çavên şil wusa pûç û vala li min dinêre, mîna ko ez dîn bûme û loma nikanim binivisînim. Ez van gotinên xwe piçekî diguherînim û dibêjimê:

— Ez nikanim, nivisandin jî hunerek e, hewesek e... lê ev tiştana li ba min tunene, keko.

— Ma tiştên weha li ba xelkê hene, çima li ba te tunene, Darîn? Bejna te bi qasî du kesên mala Garût e!

Ez zorê didime xwe ko hêrsa xwe, nerihetiya xwe binixumînim û nedim der, mîrê min. Lê ez têdigêhîjim ko xeta xwar di lawê mala Garût an jî di lawê mangeyekê de ye. Dixwazim ji nêzîktir binasim û jê re dibêjim:

— Çima tu hertim lawê mala Garût didî ber pozê min, ka wî çi kiriye ko min ne kiriye.

Birayê min du tiliyên xwe jî ber bi min bilind dike û dibêje:

— Du pirtûk nivisandine.

Mîna ko min hay jê nîne, ez dibêjim:

— Pirtûkên çi nivisandine?

— Nizanim, dibêje, tu li vir î û tu baştir dizanî. Wusa digotin... digotin, du pirtûkên pir hêja ne. Digotin ji bo heryekî jî bêjîngêk pere girtiye. Xelkê digot ji wan peran pêncsed panotên vir jî daye Keldan î dengbêj ko pirtûka wî ya dawîn ji ber bike. Keldan î dengbêj bi minetdarî pê daye zanîn ko jiberkirina pirtûkê ji bo wî şerefeke mezin e. Keldan î dengbêj

gotiye: «Ez ê ji ber bikim û bi tevgirêdaneke derwêşan gund bi gund bigerim, ez ê bigerim û mîna destana Memê Alan bibêjim.» Dayê digot ji ber van jîriyên lawê xwe, diya lawê Garût pir pozbilind bûye. Li ser kaniyê pozê xwe bilind kiriye û tew li dayê jî ne pirsîye. Dayê pir li ber xwe ketiye. Digot jê re bibêje... dayê digot ji Darîn re bibêje: ko ew du pirtûkan nenivisîne û nede ser hev, ez ê jî van herdu guliyên xwe ji binî ve jêkim... digot, ez ê jî porê xwe kur bikim û di nava xelkê de wusa bigerim. Digot diya lawê Garût ji capûnekî sipî tûrikek çêkiriye, bi rîsên rengîn neqîşandiye, veçînîye, pirtûka lawê xwe tê de bi cî kiriye, weke pirtûka pîrozwer bi dîwarê oda mêvanan ve darda kiriye.

Li vir ez biryara xwe didim, mîrê min, biryara xwe didim ko ez jî êdî du gotinan ji birayê xwe re bikim.

— ko ji destê min bihata, dibêjim, min ê binivisanda. Min ê binivisanda û hinekan jî bixwenda. Lê wek ko min got, ev karê ha ji min nayê û min dil jî nîne ko ez ji bo xatir û pesinê dê û meta xwe rabim dest bi nivisandina pirtûkan bikim.

— Ne tenê ji bo xatirê dê û meta xwe, ji bo xwe, ji bo navûdengê xwe bike... bike ko bila xelk behsa te jî, behsa navê te jî bike û em jî pê serbilind bibin.

— Ji bo ko hinek behsa meriv bike, meriv karê nivisandinê nakin, keko. Ev yek. Ya duduyan jî, ma serketina karekî weha bi pesinê dost û nasiyê, bi hukmê pere û siparîşa mitribiyê nabe ku! Ev karê ha jî huner û hewesekê divê, pîvan û daxwazekê divê. De îcar ka ew tişt tune ku! Mîna ko ev gotinên min nekevin serê birayê min, bi enirîn herdu destên xwe jî ber bi min vedigire dibêje:

— Pîvanên çi tune?

— Ez çi dizanim, dibêjim... pîvanên ko ez binivisînim û yek jî bixwîne.

— Ew çi ne?

— Ma ez û tu ê çî bikin ko ew çî ne, keko? Pîvanên nivisandinê, pîvanên xwendinê ne... pêwîstî, hêjayî, xwendin û xwendevan e... û ji bo van hemû tiştan jî bal û hayeke pêwîst. De ka bibêje ma kî heye ko van tiştan...

Ev gotinên min dîsa nakevin serê birayê min, dîsa bi enirîn berê xwe li hêlekê çerx dike û dîsa dibêje:

— Çawa kes tunene! Lawê mala Garût gotiye, pirtûka min bûye xwê, bûye wek xwêya ko tu bavêjî ber bizinan. Herkes... gotiye, herkes lê digerin.

— Ya sitar, dibêjim û bi tinaz dipişirim, jê dipirsim û didomînim: Ka ne gotiye bê ev bizinên wusa bêxwê li kuderê bûne?

— Bi vî halê xwe tinazên xwe bi xelkê meke, Darîn. Qaşo tu jî li vir î. Çima herkes dizane, tu nizanî? Mêrik... lawê mala Garût ji herkesî re gotiye. Dibêjin diya wî jî derî bi derî geriyaye, bi pesin û pis behsa lawê xwe kiriye, behs kiriye û gotiye: «Ku meriv wî bibîne têra meriv û jiyane dike. Tiştê ko nizane tune. Hertîşt, hertîştê vê dunyayê li ba wî heye. ko meriv guhdariya wî bike, erd û asiman jî tê de mîna ko meriv her çar aliyê vê dunyayê bîbîne. Meriv pê baqil dibe. Xwediyê ruhekî dunyayî û yekî asimanî ye...»

A ji te re, mîrê min, de îcar te dît bê destan çawa li hev tên, mîtolojî çawa ava dibin, Xwedê çawa tene çêkin! Li ser van gotinên wî, ez bi êş, bi tinaz û bi devê gundiyan dema me ji birayê xwe dipirsim û dibêjimê:

— Êêê... dêmax êle. De ka bibêje bê diya wî wekîdin çî gotiye?

— Ez çî dizanim, diya wî hîn gelek tiştên din jî gotiye û anuha êdî herkes jî bi vê yekê dizane... herkes pê dizane û li her deverî jî qala wî dibe. Xelk li bendî pirtûkên wî ne. Ji te re dibêjim navûdeng daye û ji îro û pê ve lawê mala Garût...

Nizanim bê çima, mîrê min, lê piştî van gotinan êdî ez nabêjim ev ezîza birayê min î mezin e, ez hurmet û qedrê biratiyeke mezin ji bîr dikim, bi hêrseke vekirî gotinên wî di devê wî de nîvçe dihêlim:

— Anuha tu dev ji lawê Garût û mangeyan berde, dibêjim, min hay ji van tiştan û rewşa wan heye. Bi kêmanî wek xwendevanekî û ji we bêtir, dibêjim, destê xwe jî ber bi van refikên pirtûkên kurdî dirêj dikim û didomînim: Tiştên ko hatine nivisandin ev in... û Xwedê dizane ew xwêya ko lawê mala Garût jî behs kiriye ev e. De fermo ev xwê û ez û tu jî bizin. Ê ez dîsa ji birayê xwe re bibêjim: Min ne nivisandiye, ez nikanim û newêrim.

Mîna ko li nava çavên min bixe birayê min destê xwe jî ber bi min li ba dike û dibêje:

— Xelk çima dikanin, xelk çima diwêrin?

Ez xwe tûj dikim nabe. Ez xwe nerm dikim nabe. Ez dinêrim ko ez çi dikim nabe, mîrê min, nakeve serê birayê min ko karê nivisandinê ji min nayê. Di dawiya dawîn de radibim bi rewşeke narihet, bi rewşeke westiyayî pê didime zanîn û dibêjimê:

— Min û xelkê nede ber hev, keko, ji bona Xwedê bes min û xelkê têke qayîşekê. Dema ko ez dibêjim, ez newêrim, nayê wê manê ko ez teresek im. Mêrxasî di karê nivisandinê de tune. Ji min nayê û dilê min naxwaze. Dema ko dil nexwaze û çavê meriv ji tişteki nebire... ew ê bibe nimûna tajiye, tajiya ko tu bi zorê berdî nêçirê. Meriv bi ser nakevin, te got erê?

— Erê, erê... lê wa ye xelk bi ser jî ketine.

— Gelek lawê bavan bi ser ketine... lê ji bona Xwedê vê yekê ne ji min re û ne jî ji xwe re bikin serêş. Ev serêşa we nakeve serê min.

Heta derengî şevê birayê min ji min re behs dike û ez jî pê hêrs dibim, pê dêşim, pê digirîm, pê dikenim û dixwazim têkevime xewê. Lê serêşek bi

min digire û xew nêzîkî min nabe, mîrê min. Ji tiştên dûr û nêzîkî aqilan serê min giran dibe û ez difikirim. Difikirim û ji nav dernakevim ko dê û bavê min çima serê xwe di ber min û vê nivisandinê de êşandine. Ji ber ko tu jî û ez jî, mîrê min, em hemû jî pê dizanin ko li ba me dengbêjek ji kîmyagerekî bêtir navûdeng dide, qedir û rûmeta sofiyekî ji peykertiraşekî zêdetir e û... û ka te got çî, mîrê min? Ê di rewş û rastiyeke weha de meriv werin ji yekî mîna min daxwaza pirtûk û nivisandinê bikin. Ya sitar û ya sitar, mîrê min!

D arîne Daryo, Darîn î lehenge vê serpehatiyê awurên xwe li portrê mîrê xwe xweş dike, ji kela dilekî tenik sîngê xwe dinepixîne û dibêje:

— Min xwendine, mîrê min. Yê me î malê jî tê de bi zimanên ciyê, bi babetên ciyê, ji niviskar û pênuşên ciyê min pirtûk xwendine û min lezeta wan hemûyan guşandine nava ruh û hundurê serê xwe. Bi aheng û harmoniya helbestên wan ez bûme bayekî payizî û bi pêlên avên çeman re herikîme, her girangotineke wan di devê min de bûye şekirekî şerabî û ez pê sermest bûme, mîrê min. Bi romanên wan re ez derketime zozanên bilind, li binê kon û reşmalan rûniştîme û ez li wir bûme bengiyê dîlberên koçerî, mîrê min. Bi trajediya lehengên çîrokên wan min çavên xwe tije av kirine û dilop bi dilop di ser balîvên şevên nîvê şevan de rijandiye, mîrê min. Heta ko zik li min hişk bibe ez bi komediyên wan, ji dêla xwe û gelek kesên din ve weke ehmeqan keniyame, mîrê min. Bi hukmê huner û afirandina fantaziya wan ez derketime bilindciyên ruhanî, li wir min destê xwe di navik û nermeciyên perîzadeyên asimanî re daye û min av ji xwe berdaye, lê anuha... anuha êdî dilê min ji pirtûkan li hev dikeve û ez dixwazim verişim, mîrê min. Wê şevê ne tenê pirtûk û pênuşên bi hunerên xweş, bawer bike ew hemû pirtûkên pîrozwer jî, ew pirtûkên bi gotinên Xwedê jî li ber çavên min reş û tarî bûn.

Û di tariya çendê wê şevê de ye ez nizanim, mîrê min, lê ez dengê bavê xwe dibîhisim. Dengê wî tê min ko li yekî hêrs dibe û dibêje:

«— De tu ê anuha bibînî!... Tu ê bibînî bê lawê kê mêr e!» Ez dibînim ko ez, bavê min, Kamîran î gundiye me û kurê wî Zade, em li berwarê çiyayekî bilind in. Li gel ko em çiyayî ne jî, heta nuha min çiyayekî wusa kûvî bi çavên tazî ne dîtiye, mîrê min. Çawa bi lêv bikim... ji ber lingên me û berjor, heta ko çavên meriv dibîne, bilind û bilind hildikişe. Meriv dibêje qeyê ne ji vî çiyayî be, asiman ê hilweşe xwarê. Di wê gavê de ez têdigêhîjim ko Xwedê çiqasî mezin, an jî ez çiqasî piçûk im. Ez nizanim bê ji kuderê dest pê dike, lê bavê min û Kamîran î gundiye me dikevîne pêsrên hev, yek dibê heft û yê din dibêje heşt. Bavê min dibêje kurê min û ew jî dibêje yê min. Ji nişka ve ez dibînim ko em li ser zinarekî bilind û bilind in. Di binê zinêr de jî asêgeheke wusa kwîr, wusa kwîr... Ji xwe newêrekiya min û Zade, an jî mêraniya bavê min û Kamîran î gundiye me ê jî di vir de diyar bibûya. Ya rastî ez naxwazim serê te jî bêşînim, mîrê min, lê peyv hatiye ser peyvê loma dixwazim ji te re bi lêv bikim. Bi kurtî bavê min dibêje lawê min mêr e û diwêre xwe ji zinêr de bavêje xwarê, Kamîran î gundiye me jî dizivire ser lawê xwe û dêbêje:

«— De ez te bibînim, Zade! Bavê xwe rûreş dernexîne!» Lê Zade bi hîskîn û bi girî xwe ji ser keviya zinêr vedikişîne û bi tirs direve. Ji keviya zinêr, ji min, ji bavê min û ji bavê xwe direve. Bi vê reva wî re ba li tûlika wî dixê û ew porê wî yê zarokiyê li nava hev dikeve. Ew bergeha hîn jî li ber çavê min e, mîrê min. Heta ko jê tê devê xwe î piçûk jî ji hev dike û diqîre:

«— Hewar û hewar!...» Dengê vê hewara wî li zinarên çiyayên hember olan dide û bi du sê dangan dîsa li me vedigere. Ew deng hîn jî di guhên min de diçinge, mîrê min. Di wê gavê de ji nêzîkî me şîrqîna tivingekê radibe û pêl bi pêl belav dibe. Tev dar û kevirên çiyayî, ez û bavê xwe jî li hawurdora xwe dizivirin û em li ciyê şîrqîniya deng digerin. Dû re em

dibînin ko dûman ji devê lûla tivinga Kamîran î gundiyê me bilind dibe. Ez dergûşê heftsale di ciyê xwe de sipûsar diricifim. Wê şevê min zaroktiya xwe jî dît û ez dîsa pê jiyam, mîrê min. Paşê em ber bi laşê Zade dibezin. Bi zikê xwe î piçûk girtiye û li ser kêlekê ketiye. Hîn ne miriye, lê bimira çêtir bû, mîrê min. Bi çavekî tirsonek û ruyekî xemgîn mîna ko daxwaza dilovaniyekê bike, destê xwe î bi xwîn û piçûk dirêjî bavê xwe dike:

«— Ez tirsiyam bavo...» dibêje û bêdeng, bêguneh çavên xwe dide hev. Di wê gavê de te bidîta bê wî bavê min çawa li min dinêrî, mîrê min. Ji awur û mirûzên wî, ez têdigêhîjim ko ji min re dibêje: «Li gor peymanana min û Kamîran, û li gor berbora çiyayên me, divê tu xwe ji zinêr bavêjî, an ne...» Ez jî bi ya bavê xwe dikim. Li gor peymanana wî û Kamîran î gundiyê me, li gor berbora çiyayên me, ez jî bi tirs û şerm ber bi kendalê asêgehê diçim, lingên xwe ji erdê hiltînim û xwe ji zinêr davêjim. Lê beriya ko ez li erdê, li zaga asêgehê bikevim... ez ji nava nivînan divenicîqim, mîrê min. Û ez bi xwe dihesim ko ez li vir, a li vê derê di nava lihêfên xwe de û birayê min jî li kêleka min e. Li saetê dênêrim, deh kêm çarê şevê ye. Ew serxewiya ko piçekî di çavên min de maye, ez bi nermikên zenda xwe wê jî ji xwe dûrdixim, radibim ser xwe, hêdîka di ber nivînên birayê xwe re diçim aliyê vê aşxanê, derî li ser xwe digirim û li wir bi axîn, bi titûn, bi qahwe dikevime ramanan. Di dawiya dawîn de ez biryara xwe didim û dixwazim li ser gotina bav û birayê xwe, li ser daxwaza mal û eşîra xwe ez jî dest pê bikim û binivîsînim, mîrê min.

Lê kaxiz û pênûs di dest min de... dikim û nakim ez nikanim, mîrê min. Wê şevê ez nikanim tişteki binivîsînim, şeva li pey dîsa welê, şevtira din, yeke din û gelekên din, mîrê min. Û di van şevan de birayê min li ber min digere, bi min de dikeve û xwe davêje bextê min ko ez binivîsînim. Ji min daxwaz dike ko bi kêmanî di van sê heftan de ez ji mala me re nameyeke dirêj lêkim, weke pirtûk bi hev xînim û bi wî re bişînim, bi gotina wî ez wî

destvala neşînim. Çi serê te bêşînim, mîrê min, di van sê heftên serlêdana wî de ev mijara nivisandinê di navîna min û birayê min de... heşa ji te, dibe gû. Li ser vê yekê serhişkiya me di hev digere û em ji hev xirabtir dibin. Bi kurtebirî wê çaxê birayê min destvala vedigere û bi qasî sê mehan piştî wê vegera xwe û welêt ji min re nameyekê bi rê dike. Xwedê dizane li wir jî wî dîsa xwe havêtiye bextekî û ev nama xwe daye nivisandinê.

Darînê Daryo ji ser sandaliya xwe radibe, ber bi refikek pirtûkxana xwe diçe, radihêje dosîyerekê, dîsa tê li ciyê berê rûdine, rûpelên dosîyerê li hev diqulibîne û di ber xwe de dibêje:

— Ka raweste, mîrê min, ez ê anuha ji te re bi deng bixwînim, lê bila di navîna min û te de bîmîne. A va ye nama ciwamêr li vir e, guhdar bike, dibêje û ji mîrê xwe re bi deng dixwîne:

«Birayê min î hêja, Darîn, bi xemgînî dibêjime te ko xwezî me şanzdeh salên din jî hevdu nedîta û bila ez van rojên îro nejiyama. Dema ko ez ji ba te vegeriyam, te bi xwe jî dît bê ez di çi rewşê de bûm.» Rewşeke pir xirab bû, mîrê min. Lepek ma bû. Te digot qeyê meriv giloka dunyayê xistiye tûrekî û ew tûra di milên wî de kiriye. Mîna ko bi nexweşiyeke bênav bikeve, mîna ko tu hêviya wî û jiyane nemîne, helisî bû, hişk û zuwa bû bû, hustuyê wî dirêj û ev herdu milên wî jî daketi bûn jêr. Çavên wî di kortalên xwe de çû bûn xwarê û ji te re sond dixwim, mîrê min... sond dixwim ko her kortalek jî mistek xwelî diketê. Ne dûrî rastiye ye ko ez ji te re bibêjim di van sê heftan de gelek kîlo jê kêmbûn, mîrê min. Ne dipeyvî, li min mêze ne fikir, dema ko min ew bi rê kir, bi min wusa hat ko nizanî bû xatir jî ji min bixwesta. Bi ruhekî vala, bi serekî vala, bi awurên vala berê xwe da min û di deriyê balafirgehê de wenda bû. De ka tu raweste ez ji te re tevayiyê nama wî bixwînim, mîrê min. Belê... «Ez nikanim wê rewşa xwe û wê rojê bi gotinan vebêjim. Lê ew şop û birînên

ko wê hevdtîna me li min hiştine, ew ê li darê dunyayê qet ji bîra min neçe. A bi wê rewşê, bi wî ruhî ez hatim malê. Pêşiyê min kir ko ez vê kêleka bi rêx veşêrim. Min xwest ko ez hinek tiştan li hev bînim û rastiye ji kesekî re nebêjim... û nemaze ji bavo re. Lê bavo zana bû, tavilê ji vê rewşa min derxist û dunya li ber çavên wî reş bû. Piştî ko min rastiya xwe û te jê re vekir, ji min jî xirabtir bû û kete nivînan. Heta heyşt rojan beriyanuha jî di nava nivînan de bû. Anuha nivînen wî vala ne. Di ber sekretê de jî weke hemû kesan ji Xwedê ne tirsîya, ji mirinê ne tirsîya, destê xwe li ber pêxemberan venegirt û daxwaza şefaetê ji wan ne kir. Weke hemû kesên li ber mirinê av ne xwest. Gotinên ko digot ev bûn, digot: "Ling bidin ser Darîn û jê re bibêjin... bibêjin bila pirtûkekê lêke." Peyvên xwe yê dawîn û nîvçe jî ji bo pirtûkê bi kar hanî û got: "Pirtûk, pirtûk... pirt..." Belê, got pirt û çavên xwe dan hev. Revena dayê jî xwe li hev şaş kiri bû, wê jî digot: "Bazdin mala seyda... bazdin û jê re kitêba miqedes bînin." Lê anuha te jî fam kiriye ko mebesta bavo ne kitêba miqedes bûye. Dilê wî pê bû û xuya bû hîn jî hêviya wî ji te û lêkirina pirtûkekê hebû. Ez naxwazim ev nama min, te xemgîn bike û ji xwe ji bo tişteki wusa jî ez ji te re naşînim. Tenê min xwest ko ez weke wesiyeta bavo, van gotinên wî yê dawîn bi te ragêhînim û te hay jê hebe. Xwedê te salîh bike û bide ser riya rast.

Bi silavên biratiyê tîm herdu çavên te.

Birayê te Sadûn

Bîstûpêncê payiza pêşîn

Not: Dayê silavan li te dike û dibêje: weke her dayikekê, weke diya lawê mala Garût... min jî Darînê xwe bi qasî neh mehan di zikê xwe de gerand, min jî dergûşê xwe bi dilovanî mijand û bi delalî mezin kir. Dayê dibêje: şîrê min jî weke şîrê dayikên xelkê sipî bû.»

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê nama birayê xwe li hev radipêçe û li pêş xwe datîne ser masê. Mîna ko anuha nû dê û bavê wî ev gotinên xwe kirine namê û jê re şandine, di wê gavê de êşa dilekî tenik xwe li kirtika pozê wî dide der, li gewriya wî belav dibe, bi çavên tije av li portrê mîr dinêre û dibêje:

— Tu dizanî, mîrê min... tu dizanî ez ne merivekî wusa dilpêt im. Li ser vê yekê ez gelekî li ber mirina bavê xwe ketim. Herçiqas ev xwestina wî li ba min tişteki pûç û vala, daxwazeke dûrî rastiya min bû, lê dîsa jî ez pê êşiyam ko min çima bavê xwe bi çavên vekirî, bi destên vala şande gornê. Heta demekê jî ez ji bandora mirina bavê xwe û van gotinên wî ne filitîm. Pirî caran bêyî daxwaza xwe ez diketim ramanan. Min xwe dûr berdida û ez dûr diçûm, mîrê min. Di her carên weha de min xwe di quncikên şikeftên reş û tarî de didît. Min didît ko ez dadidim nînoga vê tiliya xwe ya pêşanekê, dikêşim û bi qasî sê movikan dirêj dikim, dîsa bi wê tiliya xwe ez qulekê di defa sîngê xwe de vedikim, nînoga xwe ya dirêj di xwîna dilê xwe de dikim û li ser tişteki tiştina lêdikim. Nizanim bê min çi lêdikir, mîrê min. Ez nizanim bê min bi kîjan ziman û kîjan elfabê jî dinivisand. Di wê gavê de tiştê ko ez li ser dinivisînim jî ez nizanim bê çi ye: ez nizanim bê dar e, kevir e, çerm e, kaxiz e. Lê min tişteki wusa dinivisand ko... bi min wusa dihat ko heta nuha jî tişteki wusa evda-î alemekî ne xwendiyê û tucarî jî ew ê nexwîne. Piştî nivisandinê jî min lez dikir, min ew nivîsên xwe li hev berhev dikir û ez diketim riya goristanê. Hîn jî ez nizanim, mîrê min... ez nizanim bê ji herdu goristanên me bavê min di kîjanê de kirine erdê, ez nizanim bê gorna wî li kîjan aliyê dikeve û bi çend keviran bilind kirine, ez bi wê jî nizanim. Lê ez diçûm ser gorna bavê xwe, min kêla ber serê wî bilind dikir, min ew nivîsa xwe dadihanî ber serê wî û min bi sê dangan banî wî dikir, mîrê min... min banî wî dikir û digotê:

«— Bavê min î maqûl, bavê min î delal, bavê min î dilovan!... ji bo wan gotinên te, ji bo wê hêvî û wê daxwaza te va ye ez bi bêhna tariyê re hatim ba te. De ka tu serê xwe rake, rabe li pêşberî min rûne û ruyê min bibîne... ruyê min bibîne bê ez di çi rewşê de me, bavo.» Min li bavê xwe dinêrî wekî xwe î berê ye: bi kincên berê ye, bi şekalên berê ye, bi koloz û simbêla berê ye, bi salên berê ye. Û ya sitar, mîrê min!

«— Ez hîn li vir im,» digot, «ez hîn bi rê ne ketime, ez li bendî te û pirtûka te me.» Di wê gavê de bi van gotinên bavê xwe re ez ji wir bi qasî sê hezar û pêncsed salên beriya îro dûr diçim û li wir ez xwe di nava xelkekî wê demê de dibînim. Dibînim ko xetên nivisê di nava wan de jî pir pîroz e. Ew kesên li ber mirinê teşt û beroşên xwe derdixine firotanê, rez û pezên xwe hûr dikin û dikine zêr, jin û keçên xwe davêjine mezatan, pêşkêşî aliman dikin, xwe davêjine bextên wan û wan bertîl dikin ko ew ji wan re çend rêzan lêbikin. Ez dibînim alimên nivîsmend li ber dîwarê goristanekê rûniştine, li ber her yekî jî gurzeke pênûsên zîlîn, girozên papîrus û çermên gamêşan li ser hev in. Çawa bibêjim, mîrê min, rasterast weke van arzûhalciyên dema me ne. Li pêşberî wan jî meriv ketine rêzê û tiştina didine nivisandinê: ji diya xwe re, ji kalê xwe re, ji xwe re... De îcar bi tirs û streseke çawa, bi hêvî û daxwazeke çawa, mîrê min! Ji wan mişteriyan yek gelekî bala min dikişîne, ne mişterî bi xwe lê keça li ba wî, a ew pir bala min dikişîne. Ez nizanim bê keça wî ye an destirmana wî. Lê ez baş pê dizanim ko... ji bo ko tiştêkî bide nivisandinê mêrik ew keçika bi xwe re haniye û pêşkêşî nivismendekî dike. Keçik jî... çawa bibêjim, mîrê min... berzewaceke li ber kewna xwe ye. Xeftanekî mîna çerm li navmilên wê ye. Laşê di binê xeftan de ez nabînim lê ruyê wê gelekî lihevhatî ye. Alim î nivîsmend ji ciyê xwe radibe, wî xeftanî ji nav milên wê dide alî û keçik şilf tazî li pêş wî ye. Ne tenê li pêş wî, li pêş herkesî ye, mîrê min... herkes dibîne û bi min wusa tê ko herkes jî dikane bibîne. Û ez jî dibînim. Ez

dibînim ko du pêşîrên nîvgilover li ser sîng û gerdeneke genimî wek du felqên hinaran hişk dixuyin. Li jêra wan jî navikek... û li jêra wê navika gunehkar jî pirçeke firik, pirçeke heram nû girtiye dora ranên wê. Hêdî hêdî li dor keçikê difitile... ew î alim hêdî hêdî li dor laşê keçikê difitile, ji jêr û jor ve li bejnûbala wê dinêre, bi zimanekî tiştina jê re dibêje, bi du tiliyan devê wê ji hev dike, li hundurê çavên wê mêze dike, destê xwe di ser pirça berzika wê re dibe û tîne, kulêmeka wê saxî dike û ditepîne, paşê jî destê xwe li pêşîrên keçikê dipelîne û di mista xwe de diguvişîne. Pêşiyê bi mana erê serê xwe dihejîne, dû re li ber çermekî gamêşan rûdine û tiştina lêdike. Heta ko ew î alim vî karê xwe diqedîne, ez jî bi mereq temaşa vê rewşê dikim. Ew mişteriyê ko êdî tu jî pê dizanî, a ew jî wî çermê nivisandî dide bincengê xwe, tev wî laşê ter û ciwan keçikê li wir dihêle û bi gavên bextiyar, bi gavên ewle, bi gavên bêşerm ji ber dîwarê goristanê dûrdikeve. Ez dibînim ko ew tirs û stresa bi qasekî berê bi mêrik re ne maye. Mereqdarî li min zêdetir dibe û ez bi pey mêrik dikevim. Ez dixwazim bixwînim û bizanim ka çi hatiye nivisandin, mîrê min. Ez dixwazim bibînim ka çawa hatiye nivisandin. Lê mêrik serê xwe li ba dike û ez wusa têdigêhîjim ko merivên vê dunyayê nikanin bixwînin. Xwe bi xwe, ew ji bo wan ruhên dunya aliyê din e, dibêjim. Û wek ko min got, mîrê min, a ji wê rojê û pê ve ev bergeh, ev raman car bi car li min bû mêvan û hîn jî em ji hev ne dûr in. Ez nizanim ka bê bavê min hîn jî li bendî min û pirtûkekê ye an ne, lê min ne xwest diya min jî bi hesreteke weha biçe û gotinên weke wan gotinên bavê min li pey xwe bihêle, mîrê min. Min ne xwest diya min şîrê xwe li min heram bike û biçe, loma... loma piştî vê namê, piştî van xeberên naxoş û piştî van hemû tiştên ko min ji te re gotin, êdî min jî biryara xwe da, mîrê min. Anuha tu jî bi kerem dizanî ko... li vir ev dibe cara duduyan ko ez biryareke welê didim. Belê, min

biryara xwe da ko ez jî ji diya xwe re pirtûkek weke wan pirtûkan, pirtûkek mirinê(*) binivisînim, mîrê min.

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê dest davêje darê qelûnê, sê tilî titûna nû didewusîne serika wê, agir pê dixê, tev gepeke dûman wê jî ber bi portrê Ahmedê Xanî radike û didomîne:

— Dîsa gotin hatiye ser gotinê, mîrê min... sêsed sal, bi qasî sêsed û çend salan beriya nuha dibêje: «Da xelk nebêjtin ku: ekrad bê marîfet in, bê esl û binyad; enwaî milel xwedankitêb in, kurmanc tenê di bê hesêb in.» û ez jî... ji mîrê xwe re bibêjim, anuha êdî cenabê te jî bi kerem têderxist bê min ji bo çî xwest ez dest pê bikim û binivisînim. Lê beriya ko ez dest pê bikim, min xwest ez rewşa lîteratura zimanê malê ji nêzîktir, pir ji nêzîktir ve bibînim, mîrê min. Ji ber vê yekê jî ez bêtir ketim nav pirtûkan, ez ketim nav pirtûk û niviskarên wan. Û ev dibe sê sal ko ez bi wan re digirim, bi wan re radibim, bi wan re rûdinim û ez guhdariya wan dikim. Heta vî danê sibê jî ez di nava wan de bûm, mîrê min.

Mîna ko anuha gotinên Darînê Daryo, gotinên Darîn î lehengê vê çîrokê biqedin û tiştên ko ew ji mîrê xwe re bibêje nemîne, bi qasî du hilmên qelûnê bédengiyek çêdibe, dû re awurên wî li kîsê dermanên ser masê asê dibin û bi dengekî nizm:

— Nabe, mîrê min, nabe... dibêje, devê kîs lê vedike, yek bi yek wan dermanên tê de derdixê, lê dinêre, nivîsên li ser bi deng dixwîne û dîsa datîne ciyê berê. Dema ko pakêta dawîn derdixê, li portrê mîr dinêre, keserekê vedide, pakêtê jî ber bi wî bilind dike û didomîne:

— Antî depressiv. Ilmê te fere ye, têngêhîştî ne wusa, mîrê min... a îro jî... te dît ko ez bi gavekî berê hatim, min ji te re got ko heta vî danê sibê jî ez di nava wan de bûm, dibêje, wê pakêtê jî di kîsê vekirî de datîne ber wan dermanên din, bi keservedan xwe bi palgiya sandaliya xwe ve dizeliqîne û dibêje:

— Yê min jî... va ye êdî tu bi xwe jî dibînî bê çawa ye, mîrê min. Ez li nexweşxanê bûm, ez dibêjim nexweşxane lê tu bibêje tîmarxane. Îro... vî danê sibê li ser edebiyatê komcivîneke entellektuelan hebû. Ji xwe çî bû di wê komcivînê de bû, mîrê min. De îcar te bidîta û te bibîhisiya, mîrê min, ma çî ne digotin ku!

Li vir destekî xwe li ba dike, ji sandaliyê radibe ser xwe, ber bi aşxanê diçe û di ber xwe de bi pilepil dibêje:

— Bi destûra te, mîrê min, ez hinek av bînim... ez hinek av bînim û ji mîrê xwe re bibêjim. Tiştên seyr in!

Diçe piyaleke av tîne, datîne ser masê, li ser lingan ji wan pakêtan yekî vedike, du heban jê derdixe û di ber re jî her dipeyive û ji mîrê xwe re dibêje:

— Ya rastî doktor ev tiştên ha li min qedexe kirine. Ji min re got:

«— Ji mijar û ramanên weha dîrkeve û heta ko ji te tê li ser van tiştan nekeve heftûheyştê.» Ji xwe ez jî ne merivekî wusa me ko bi hinekan re têkevim heftûheyşta van tiştan. Ez dizanim, mîrê min... ez baş jî dizanim ko tiştên wusa pere nake.

Li ser lingan wan heban dide ser zimanê xwe, ji nîvê ava wê piyala ser masê devê xwe tije dike, di gewriya xwe de berdide, bi tiliyan devê xwe paqij dike, wek wan qumarçiyên ko bi hêrs qeremaçên xwe li erdê didin, ew jî binê piyala xwe li masê dide, wan gotinên xwe yên jorîn dubare dike:

— Pere nake, mîrê min, dibêje û rûdine. Piştî bédengiya çend hilman destê xwe li ser wan name û kovarên ser masê digerîne, radihêje çendekan û lê dinêre, bêyî ko veke dîsa datîne û dîsa berepaş xwe bi palgiya sandaliya xwe ve dişidîne. Mîna ko anuha êdî piçekî rihet kiriye, bi pişirîn li portrê mîr dinêre û dibêje:

— De îcar min ji te re çîroka vî danê sibê ne got, mîrê min. Ji semînerdarên komcivînê, pêşiyê yek rabû... yekî çawa bibêjim... ez nas nakim, ji nêzîk

ve nas nakim, lê ewqas tişt li ser vî ciwamêrî hatine gotin ko êdî herkes pê dizane. Herkes pê dizane û dibêjin xwediyê navûdengekî qelew e... dibêjin ji navê Xwedê bêtir ji vî navê xwe hez dike. Xêr û guneh li hustuyê wan be, lê dibêjin ko tu bi qasî bêhna cixarekê li ba wî rûnî, tu ê baş bibînî ko rasterast nexweşê nav û mezinbûna xwe ye. Ez newêrim bibêjim, mîrê min, lê ez bawer im rastiya van gotinan jî heye. Bi min jî wusa hat. Mêrik rabû û yekser weke bûkan behsa xwe kir û got:

«— Edebiyata me... binêrin dema ez ji bo konferansekê li Helsîngforsê bûm, ji min pirs kirin ka edebiyata me di çi rewşê de ye. Ew tiştên ko min li wir ji wan re gotin, ez dixwazim anuha li vir ji we re jî bibêjim. Edebiyata me di erdekî hişk de kulîlk e, giya ye, nîsk e, nok e û jê re av divê. Pêwîstî bi avdanê heye. A ez jî... heta ko ji min tê ez jî van nokan avdidim. Barê min giran e. Karê min giran e. Pir dijwar e. Ez bi tenê me. Ez dizanim. Lê dîsa jî bi her awayî, bi her celebî, bi her rê û metodê, bi şev û bi roj ez avê dikêşim ser vî erdê hişk ko ew nokên ter û şîn hişk nebin...» Bi van gotinên wî re ji guhdaran yek rabû û... Xwedê dizane ji deştê bû, mîrê min, rabû û gotê:

«— Ya maqûl, meriv nokan avnadin ko...» Nizanim çima, mîrê min, lê li ser van gotinên ew î deştî semînerdar kurt lê vegerand û bi enirîn gotê:

«— Tu nokan avnadî, lê ez avdidim!» Ew î deştî dîsa pê da zanîn û gotê:

«— Ne ko ez avnadim, ezbenî. Min ne got, ez avnadim. Min got, nok nayêne avdanê!» Semînerdar bêtir tengijî, destê xwe jî li ba kir û gotê:

«— Tu fam nakî. Wek ko min got, dema ko min ev gotinên xwe di konferansê de gotin, pencsed kesan ji min re li çepikan xistin, hezar dest li hev ketin û ji bo van gotinên min deng derxistin. Ê anuha ev deng li her deverê belav bûye. Lê tu... tu têngêhîjî.» Ew î deştî dîsa danexwar, mîrê min, gotinên xwe dubare kirin û dîsa gotê:

«— Kê ji te re dest û lingên xwe li hev xistine ew tiştêkî din e. Ez dibêjim nok nayên avdanê û çima nayên avdanê ez ji te re bibêjim: Dema ko nok bi qasî bihustekê bilind dibe û baçil pê dikeve, bi gotina te, ter û şîn dibe... bi zimanê me gundiyan şoraviyek digire ser. Tiştê ko nokan dikin nok jî ev şoraviya wan e, te got erê? Ê ko tu rabî nokan avbidî, tu ê bişewutînî, te dîsa got erê? De îcar tu rabûyî ji me re behsa destên hêlîngforsîyan dikî... ma ew çî dizanin bê nok çî ne! Ew hêj nizanin ka bê nok bi dar an bi giyan ve tîn...» Semînerdar vê carê destê xwe jî ber bi ew î deştî dirêj kir û gotê: «— Tu jî hîn nizanî bê ez behsa çî dikim. Li vir ez bi zimanekî edebî dipeyivim. Ez dixwazim behsa edebiyatekê bikim... ne gundî û nokên wan!» Li ser van gotinên wî, ew î deştî rabû ser lingan û gotê: «— Anuha tu behsa çî dikî bike, lê ez dibêjim dema ko tu nimûnên xwe didî, bila ne ji dunyayê der be, bila ne dûrî aqilan be. Bibêje, edebiyata me kundir e û ez jî avdidim. Wê çaxê... a wê çaxê gotinên te ê ciyê xwe bigirin.» Semînerdar enirîna xwe kir hêrs, hêrsa xwe bilind kir, dengê xwe bilind kir, destê xwe bilind kir û dîsa ji ew î deştî re got: «— Tu nuha dev ji kundurê xwe berde, tu fam nakî. Binêre, ez hunermendek im. Ez niviskar im. Ez edebiyat û zimanekî çêdikim, zimanekî nû... ji vî zimanî re bi fransî dibêjin: une langue nouvelle. Îro di gelek kovar û rojnaman de li ser vî zimanê min, li ser kitêbên min, li ser niviskariya min, li ser huner û jîriya vî tiştî dinivîsînî û ji min pirs dikin ka çima ez li ser gundiyan nanivîsînim. Ez li ser maqûlên wusa dinivîsînim ko... ez dibêjim dema lehengê min bimire bila xwendevan li pey bigirî. Ez naxwazim xwendevanê min li pey lehengê min bibêje: »De gundiyeke bû û mir bila bimire!« Ez van tiştan bi zanî dikim. Ev zanîna min jî berhema niviskariyeke bîst û pênc salan e. Ez lehengên xwe hildibijêrim. Ez gotinên xwe hildibijêrim. Ez hevokên xwe hildibijêrim. Ev hunerek e. Nokên ko ez behs dikim, nokên nû ne, nokên edebî ne. Biçe lê bigere û bi xwe bibîne

bê çawa behsa meziniya vê hunera min dikin. Ma ez ê rabim piştî van hemû tiştan ji te hîn bibim ka ez ê çi bibêjim ko gotinên min ciyê xwe bigirin! Şerm e! Ez ne gundî me. Tu gundî yî, wê çaxê tu jî biçe karê xwe bike!» Gundî jî karê xwe kir, mîrê min. Bi hêrs rabû pênûsa di destê xwe de şikand, dîsa bi wê hêrsê li erdê xist, ji salona komcivînê derket û careke din jî venegeriya hundur. Dû re ji min re gotin ko ev herdu serî hevdu baş nas dikin. Dibêjin ev ne cara pêşîn bûye ko ev herdu zatên ha ketine pêşîrên hev. Careke din jî wusa bûye. Dîsa tişteki wek vê noka bêyom di navîna wan de bûye sedem ko rabin hev. Dibêjin wê çaxê jî dîsa ev deştiyê ha ji ciyê xwe rabûye û li ruyê wî gotiye:

«— Tu gotinên pûç û vala li ber hev rêz dikî! Mîna ko ev jî marîfeteke mezin be, tu dixwazî meriv ji bo van gotinên te li çepikan bixin... Lê ez newêrim tişteki weha bikim. ko meriv bi çewtî ji te re bibêje: dirûvên Homerosekî bi te dikeve, ji bo ko xwe bişibînin Homeros tu ê rabî rahêjî kevçî û çavên xwe derxînin... tu dixwazî rengê xelîfekî edebiyatê bidî xwe û xutban li ser navê xwe bidî xwendinê. Mîna ko hukmê lîteraturê di destê te de be, tu ji xwe re li pey koloniyên edebiyatê digerrî û hew.» Xwedê dizane bê çima, lê mîrik rabûye ji vî semînerdarî re gotiye: «Tu mytomanekî mezin î!» rasterast gotiye, «tu nanê bêxwê dixwî, tirên şor dikî.» De îcar em ji çîrokê... em ji komcivîna vê sibê dûrketin, mîrê min. Piştî ko ew î deştî derket û çû... semînerdarê helsîngforsîyan, bi gotina ew î deştî, vî mytomanê mezin behsa hinek tiştên din jî kir. Bi zimanê xwe î nû, bi gotina wî, bi une langue nouvelle behsa edebiyata me kir, behs kir û got:

«— Dar hildikişe. Dar qalind dibe. Dar bilind dibe. Dar mezin dibe û dibe darek siltanî.» De îcar Xwedê dizane bê wî dixwest bi van gotinên xwe çi bibêje. Lê ko ez li xwe mikûr werim û bibêjim, min tişteki ji vê dara wî dernexist, mîrê min. Ya rastî min xwest ez rabim vê têngêhîştina xwe pê

bidime zanîn û bibêjim: Bi van daran tu dixwazî çî bibêjî, lê ez ranebûm û min ne gotê. Min nexwest ez jî bibim deştiyekî duduyan, mîrê min. Ê piştî van heftûheyştan dor hate yekî din. Şaîrekî kevin bû, mîrê min. Nizanim çima, lê bi hêrseke mezin bû. Dema ko dipeyvî kef bi devê wî diket û... digot:

«— Hûn behsa çî dikin bikin... hûn çî dibêjin bibêjin. Lê lezet di helbestên we û îro de tune. Weke wan firingiyên ko meriv di kayê de sor bikin, helbest li vir çênabin. Li van deran...» digot, «mijar tune ko meriv li ser binivîsîne. Ez helbestên we dixwînim, dinêrim ko li ser êş û xaça Îsa ne, li ser şiv û fermanên Mûsa ne. De îcar werin li welêt binêrin. Şikir ji Xwedê re bi sedan Îsa û Mûsa derketine. ko em bixwazin em dikanin Xwedayan jî çêbikin. Îro li dunyayê, li ba me bi sedan gund dişewutin, bi hezaran meriv têne kuştin, bi mîlyonan meriv koç dikin. Divê meriv van mijaran bibînin, berhev bikin û binivîsînin.» Min xwest ko ez rabim û jê re bibêjim: Ya seyda, edebiyat afirandin e, edebiyat nayê berhevkirin, lê min ne got, mîrê min. Min ne xwest ez jî têkevim heftûheyşteke. Lê ji guhdaran yek rabû... ciwamêrek rabû û gote wî:

«— Heyfa wan bajar û gundan e ko ji bo helbesteke xweş dişewutin.» Li ser van gotinên guhdêr, şaîrê kevin jî hêrsa xwe mezin kir, av û kef bi devê xwe xist, tiliya xwe jî li wî ciwamêrî bilind kir û gotê:

«— Binêre, Melayê Cizîrî bûyerên xelkê xwe, li ser tahtên welatê xwe dinivîsand û weke helbest dîsa li ser wan tahtan dixwend. Dema ko xwendina helbestên xwe diqedand û radibû diçû, ew tahtên ha ji hukmê helbest û xwendina wî mîna sêlekê disincirîn û jin û bûkan jî diçûn hevîrê xwe pê ve didan. Lê tu têngêhijî ku!» Li vir jî herdu seriyên ji hev gazin dikirin, mîrê min, gazin dikirin ko yê hember têngêhije. Dû re ji semînerdaran yekî xort rabû ser kursiyê. Yekî çawa bibêjim, Xwedêyo... yekî wusa ko nayê gotinê, mîrê min. Cil û bergên li ser wî ne tiştên şaîran

bûn. Cotek potînên bêcir di lingan de, parkekî ji van rengên leşgerî li navmilên wî bû, ya sitar! Bi zincîr, bi xelek, bi bêrîk û bi gelek tiştên seyr bû. Meriv digot qeyê nû ji leşgeriyê reviyaye. Şêla şaîran pê ne diket. Rabû weke gamêşê ko bîna avê bike hustuyê xwe dirêj kir, serê xwe rakir, awurên xwe li jor li dereke zikê salonê asê kir, çavên xwe dan hev û dest pê kir. Bi min wusa hat ko... ne tenê bi min, ez bawer im ko hespan jî ev rewşa wî bidîta û guhdariya wî bikira, ew ê bigota ev maqûlê ha ji aqil û kîsên hinekan dipeyive. Belê, pêşiyê navê gelek çem û çîyan, navê gund û bajaran, navê deşt û çolan bi lêv kir û da zanîn ko wî ji wan deverina ji me re silavên germ û agirî hanîne. Dû re li gotara xwe zêde kir û da zanîn ko divê meriv ji bo tiştên mezin kar bikin, divê pênuşên niviskarên me mezin bin ko pê roman û dîwanên mezin werine nivisîn, bi pênuş û serên piçûk çîrokên kurt jî nayêne nivisandinê, divê meriv zimanê xwe mezin û fere bikin... digot:

«— Kê gotiye ko zimanê me têr nake û naşêrîn e! Zimanê me zimanekî wusa ye ko dema meriv guhdarî dike, meriv dixwaze bajo ser kozikên dijmin!...» Li vir jî min xwest ko ez rabim û bibêjimê: Wê çaxê ew hemû teresbavên ko li vê dunyayê najon ser kozikên dijminên xwe, divê pêşiyê zimanê me hîn bibin. Zimanê me hîn bibin ko biwêrin bajon ser kozikan... Lê dîsa min dengê xwe ne kir, mîrê min. De îcar ciwamêr ev gotinên xwe jî bi tirkî digot... digot û didomand:

«— Geniş düşünmeliyiz, büyük düşünmeliyiz, large düşünmeliyizki ölümsüz eserler yaratalım. Bunun da tek yolu ordulaşmadan geçer: yazarlar ordusu, sanat alayalar, kültür taburlar yaratmak gerek. Kalemimiz silah, silahımız kalem olsun!»(*) Ez nizamim, mîrê min, lê piştî axaftina van ciwamêran baweriyek welê li min peyda bû ko... Ez dibêjim, ko meriv bixwaze yekî bixapîne divê meriv bi tirkî bipeyive û ko meriv bixwaze xwe bixapîne divê meriv bi kurdî bipeyive, te got çî? Li vir jî min

kir ko ez rabim û jê re bibêjim: Ya maqûl, şêrîniya vî zimanê me î şêrîn çima tu bi zimanê me î şêrîn nabêjî... çima edebiyateke wusa eskerî û bi unîform! Lê weke hertim min ev gotinên xwe jî di hundurê xwe de nixumand û ne gote wî. A wê çaxê... ji xwe çî bû a wê çaxê bû, mîrê min. Di wê gavê de min generalên helbestan dîtî, min kapîtanên novel û romanên dîtî, min çawîş û onbaşiyên nivîsên bi babetên ciyê dîtî... bi kurtî hemû qumandarên lîteraturê bi meşeke leşkerî di ber min re derbas bûn. Ji vê bergehê ken û girî di hundurê min de li hev ket, keliya, kef da û di kaniyên çavên min de dan der. Berê çavên min reş bûn, dilê min li hev ket û wekî din jî... wekî din jî tiştêk nayê bîra min, mîrê min. Min çavên xwe li nexweşxanê vekir.

Darînê Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê bi qasî çend hilman serê xwe dixê ber xwe, mîna ko anuha bi raman li tiştêkî asê bibe, bi awurên vikûvala li kîsê dermanên xwe dinêre, dû re bi nîvşerm û nîvxemgînî vedigere ser portrê mîr, bi herdu destan serçavê xwe mist dide û bi rewşeke bêxew dibêje:

— Doktor hat paş serê min, mîrê min, li paş serê min nav û paşnavê min pirsî...

Mîna ko hay ji çewtiyeke xwe bibe, li vir bi tevgereke bêçare herdu destên xwe jî ber bi portrê mîrê xwe vedigire û dibêje:

— Tu bi xwe jî dibînî, mîrê min, tu dibînî ko hiş di serê min de ne maye. Min ji bîr kir ko xwe bi te bidime naskirinê. Gerçî ne girîng e, lê weke edet... ez dibêjim edet lê tu bibêje weke nexweşî. Belê, tiştêkî wusa jî derxistine ko divê meriv çêlî xwe bikin. Ne tenê çêlî xwe, di roja îroyîn de radibin behsa gelek tiştên din jî dikin. Behsa tiştên wusa dikin û tiştên wusa dibêjin ko anuha ez şerm dikim ji te re bi lêv bikim, mîrê min.

Ji nişka ve û bi hêrs radibe, ji ser masa nivisandinê radihêje pirtûkekê(*), dîsa bi wê hêrsê li ser lingan rûpelan lê diqulibîne, bi dengekî nizm ji dereke wê tiştina dixwîne, dû re li mîrê xwe vedigere û dibêje:

— Li gor gotinên mêrik... mêrik behsa jiyana xwe dike, mîrê min, xêr û guneh li hustuyê wî lê li gor gotinên wî: hîn di piçûktiya xwe de xwediyê kultureke kevnare bûye, bala wî li ser şexsiyetên mezin bûye, çavên wî hertim li ciyên bilind bûye. Ev tiştên ha jî di pêçekiya wî de dê û pîrika wî, bav û kalikê wî... her yekî ji alîkî ve di guhên wî de gotine û ew kultura me ya bi qasî pênc hezar salan kevin kurisandine hundurê serî wî. Li Diyarbekirê ew taxa ko di wextekê de mala Cemîl Paşayê bapîrê Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa lê bûye, anuha mala wan jî li wir, li wê taxê bûye. De îcar di şeş saliya xwe de dest bi niviskariyê kiriye. Berhemên wî yê çapnebûyî gelek bûne... li gor ko mêrik dibêje, ji dusedî zêdetir berhemên wî hene û hemû jî anuha di serê wî de ne, mîrê min.

Pirtûkê davêje ciyê berê, rûdine, radihêje qelûna xwe pê dilîze, dikêşe û dibêje:

— De îcar em vegerin ser pirsê xwe û ez ji mîrê xwe re bi kurtî bibêjim: Ez ne xwediyê jiyaneke wusa rengîn im. Navê min Darîn e... Darînê Daryo dibêjine min. Ez ji gawestiyên malên Cemaldînên serhedî me û anuha ji wan deverina dûr ez jî li vir dijîm. Vir, dibêjim... nizanim bê te ji serma wê derxist an ne, mîrê min, pir sar e. Lê dîsa jî... yekî ko di çelê zivistanê de jî ji ba me were vir, ji te re sond dixwim beriya ko bi bapêşê bikeve ew ê bi bayê vê niviskariyê bikeve. Çiqas ji vê rengdêrê hez dikin! ko meriv ewqasî ji Xwedê hez bikira, meriv ê ji buhuştê ciyê herî xweş bi dest xwe bixista. Ne ko ez tiliya xwe di çavê xwe re dikim û dibêjim bila ji nava me dernekevin, lê streseke nivisandinê bûye nexweşiyêke têgerîn û li van deran digere, mîrê min. Li van deran baweriyeke wusa şîn bûye ko divê meriv pirtûkekê binivisîne... mîna ko yek pirtûkekê nenivisîne ew ehmeq

e, mîrê min. De îcar mîna ko ji van pirtûkan (destê xwe ber bi dolabeke binê refikên pirtûkxana xwe dirêj dike) yek têr nake, mêrik radibe ya duduyan jî dinivisîne. Wusa dike ko meriv jî jê re bibêje, a îcar jî tu bûy yekî ehmeqtir. Û ne dûrî aqilan e ko ez ji mîrê xwe re bibêjim di van çend salan de ji hemû şaxên lîteraturê me pirtûk hene û zêdetir jî. Zêdetir dibêjim... bi gotineke din ji vê hingema ha şaxên seyr, tiştên ewqas seyr û nû derketine ko ez ne bawer im îro li ba îngilîzan jî navekî jê re peyda bikin. Na, ne gengaz e ko ev şaxên wusa di zimanekî din de hebin, mîrê min.

Bi van gotinên xwe re dîsa radibe ser xwe, destê xwe ber bi refikên pirtûkxana xwe dirêj dike û:

— Binêre, mîrê min... de îcar ne tenê ewqas in jî, wek ko min got li vir jî hene, dibêje, diçe destê xwe davêje kersega dolabeke binê refikên pirtûkxanê û bi kenekî manedar didomîne: Ev yên ha... ya rastî min dixwest ez wan bişewutînim. Lê dû re min nêhirî ko bi şewatê nabe, mîrê min... min got ew ê rûmeta van û wan hemû pirtûkên ko di wexta xwe de bi şerefmendî şewutîn tevlihev bibe. Min ne xwest mikro û makro li nav hev bikeve, min ne xwest çê û xirab têkeve nav hev. Loma min ev yeka ha ne kir, mîrê min. Min ew agir ne kirin. Min got ew ê rojekê teresbavek rabe navê min û Amr ibn al-As(*) tevlihev bike. Ji ber vê yekê ye, mîrê min, a ji ber vê yekê ye ko min ew havêtine paş vê kilîtê. Anuha tu ê mereq bikî û bibêjî ka gunehkariya van pirtûkan çi ye?

Ber bi masa xwe diçe, ji çavikekê kilîtekê digire, li kersegê tîne, dolabê vedike, pirtûkekê jê derdixe, ber bi portrê mîr nêzîk bilind dike, du sê caran dihejîne, mîna şanogerekî hêdî hêdî li rasta odê digere û dibêje:

— Ko jinek ne bi dilê meriv be, meriv dikane çavên xwe bigire û dîsa jî wî karî bike. Lê... lê ko pirtûkek ne bi dilê meriv be, meriv nikane çavên xwe bigire û bixwîne. Û dibe ko mezintirîn hustuxwariya pirtûkekê jî ev be...

te got çî, mîrê min, dibêje, wê pirtûkê davêje ser masa rasta odê, ji dolaba paş kersegê yeke din derdixe, bi mirûzekî tirş li pêş û paşê wê dinêre, li kefa destê xwe dide, her bi wê hunera şanogerekî di odê de diçe û tê, ji nişka ve li portrê mîr dizivire û dibêje:

— Ko ji niviskarekî re zarokek çêbe û ew zarok seqet be, bêyî dest û pê, bêyî poz û goh be... niviskar ê riyekê bibîne, ew ê kêmasiya zarok bavêje ser Xwedayekî û ji nav derkeve. Lê ko di pirtûkek wî de seqetiyek hebe... a wê çaxê divê hinekî li ser bihizire. Te got çî, mîrê min?

Li vir yeke din ji paş kilîtê derdixe, lêvên xwe bi hev ve dişidîne, bi hêrs û bêhêvî davêje ser masê dîsa li mîrê xwe dinêre û dîsa dibêje:

— Heta nuha pêwîstiya min ji Xwedê ne bûye ko ez destê xwe li ber vegirê, mîrê min, lê anuha ez destê xwe li ber wî jî vedigirê û dibê: Xwedê, heta mirineke bi destê te bila haya ev yên ha ji hunera xwe nebin, lewra wê roja ko wan hay jê bibin, wê çaxê ne bi destê te, ew ê xwe bi destên xwe bikujin û têkevin ber xwîna xwe!

Piştî çend tiştên weha bi hêrs dadide wan pirtûkên li ser masa rasta odê, li ber dolaba binê refikan çog dide erdê, bi hêrs davêje ciyê berê û dîsa bi hêrs kilîtê li derê dolabê dixîne. Di rabûna xwe de destê xwe jî ber bi wê kersegê rep dike û dibêje:

— Ya rastî diviya bû meriv xwediyên wan bavêtana paş deriyan û ji wan re bigota... Na, mîrê min, ez gotina xwe nabêjim. Ez newêrim bibêjim. Ma tu ê ji kê re bibêjî ku! ko tu ji yekî re tişteki bibêjî, ew ê tev hêrs û enirîna xwe tişteki din jî li te vegeirîne û ew ê ji te sil bibe. Ew ê di newrozan de jî di ber te re derbas bibe û silavan li te neke, mîrê min.

Ez şerm dikim, mîrê min, ez şerm dikim ko ez di dem û dunyayeke weha de dijîm. Dibêjin li dunyayê tenê du tişt hene ko meriv pê dikevin rewşên teng û naxoş: yek jin û yek jî zimanê meriv. Lê anuha ez tişteki din jî lê zêde dikim û dibêjim, bêpîvaniya karê nivisandinê jî. Lê eva sisiyan... Di

wexta xwe de ûris nivê dunyayê bûne û ji wî nivê dunyayê Trdeyakovskiye(*) tenê derketiye, lê diyar e ko wusa bidome ji van Trdeyakovskiyan em ê gelean derxin. De îcar tîpên wusa... tîpên ko tiştêkî ji hev dernaxin, tîpên ko diya xwe di fîstaneke din de bibînin nas nakin... tîpên ko meriv di ber de bêşin, di ber de bişewutin, di ber de şerm bikin ne yek û ne dudu ne, mîrê min. Dema ko ez li ser van hemû tiştan dikevim ramanan û lê hûr dibim, a wusa... dilê min li hev dikeve û ez dixwazim verişim. Xwezila min bi wan deman, wan demên ko ez ji van tiştan dûr. Ê hîn gelek tişt hene, mîrê min, gelek gotinên min hene ko ez ji te re bibêjim. Lê wek ko min got, ez naxwazim serê te jî pê bêşînim, mîrê min, ez naxwazim bêhna te pê deng bikim û... û doktor ji min re got bêhna xwe teng meke, got tu çawa rihet dikî wusa bike.

Diçe ji derekê radihêje perdeyeke reş, bi aliyekî pirtûkxana xwe ve dike, dixwaze bikêşe pêşiya tevayiya wê û di ber re jî bi pilepil dibêje:

— Ez ê jî êdî nekim ko tiştêkî binivînim, mîrê min. Bila diya min li min bibore. Min destê xwe ji şîrê diya xwe şûştiye. Min dixwest... min pir dixwest ko ev gotinên min... wek ko hezretê Eyub dibêje:

”Xwezî anuha ev gotinên min bihatana nivisandin!

Xwezî di pirtûkekê de berhev bibûyana!

Bi pênuşeke hesinî, bi qurşûnê

Li zinaran bihatana kolanê ko her û her bimana.” Lê ez nikanim, mîrê min. Mîna ko tu jî êdî têderdixî, ez nikanim û nivisandin ji min nayê, ez ji te re sond dixwim ko êdî ez nikanim bixwînim jî. Ez ê nexwînim, dibêje, wê perda reş dikêşe berê pirtûkxana xwe, bi xemgînê û bi dengê bilindtir didomîne:

— Bila li min biborin, bila ew hemû niviskarên ko vekîşyan şikeftên bêhtengîn, şevên nivê şevan jiyan li xwe herimandin û jidil xwe sipartin hunerên xwe, ew niviskarên ko rûreşî ne kirin, ew niviskarên ko derew û

bêbextî li lehengên xwe ne kirin, bi wan re jîyan, bi wan re êşîyan, bi wan re giriyan, bi wan re ketin û mirin... a bila ew hemû maqûlên erbabên karê xwe li min biborin, dibêje, bi rewşeke jihevketî tê li pêş portrê mîr dîsa di sandaliya xwe de rûdine, bêyî ko veke wan name û rojnamên li ser masê dide aliyekî, serê xwe dike nava herdu lepên xwe, di ser çogên xwe de xwar dibe, diponije... û anuha li ba wî dîsa deng tune, dîsa ronahî tune, dîsa wext tune, dîsa Xwedê tune û dîsa dunya li dora xwe çerx nabe.

Epîlog

Di wê gavê de, rasterast di wê gavê de ez çûm li pêş Darînê Daryo, li pêş Darîn î lehengê vê çîrokê rûniştim û min gotê:

— Baş e, ez ê binivîsînim.

Bi mitûmatî li min mêze kir û got:

— Tu ê çî binivîsî?

Min got:

— Van gotinên te... ez ê van gotinên te binivîsînim û bikim pirtûk. Ez ê yeke welê binivîsînim ko bi hemû dewr û dewranan xweş be, herkes bi zimanê xwe î arizî şirove bike û li ba xwe rûmetekê bideyê.

Bi xemgînî, bi çavên tije av got:

— Tu ê çîma binivîsî?

Min got:

— Te gotinên bavê xwe bi cî ne hanî, te daxwaza diya xwe bi cî ne hanî, lê ez ê vê êşa te bi lêv bikim.

Mîna ko ev behsa dê û bavê wî wan çavên wî biguvisîne av jê rijîya û got:

— Na, meke!

Min got:

— Çîma na? Ma te ne got, xwezî anuha ev gotinên min bihata nivîsandinê?

Bi girêkên tiliyên xwe çavên xwe zuwa kirin, li min mêze kir û got:

— Na, hezretî Eyub weha gotiye.

Min got:

— Te çima ev gotinên hezretî Eyub bi lêv kirin?

Hustuyê xwe xwar kir û got:

— Dilê min tenik bû û min jî ev gotinên wî bi lêv kirin.

Min got:

— Baş e, dilê min jî li van gotinên te rûnişt û ez dixwazim wan binivisînim.

Di dest de li min vegerand û got:

— ko tu bi gotina dilê xwe bikî û binivisîni, tiştê ko ez ji te re bibêjim tune. Lê tenê tiştê... ji min nepirse û nebêje çima, lê ez tiştê tenê ji te daxwaz dikim.

Darîne Daryo, Darîn î lehengê vê çîrokê daxwaza xwe ji min re bi lêv kir. Li ser vê daxwaza wî li pêş mîr Celadet Alî Bedirxan û li hafa seydayê erd û asiman Ahmedê Xanî min jî soz dayê ko ez li dawiya vê çîrokê van gotinan jî binivisînim û bibêjim: "Ev çîroka ha divê bi zimanekî din neyê xwendinê, divê her û her bi zimanê xwe î malê bimîne."

Herweha nîvê êşa lehengê xwe min jê girt, nîvê titûna qelûna wî ya dawîn min kişand, nîvê hêsirên wî min ji kaniyên çavên xwe rijandin, li nîvê textê wî yê razanê min cî da xwe, wê şevê nîvê balîva wî min serê xwe da ser û em bi hev re ketin xewê.

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: HESENÊ METÊ

Weşandin: 2005-06-29

Xwendin: 13872

**

Term

Ji zindana tenêtiyê heta îşareta çav

Deşta rexê bêdengiyê

Berf girtiye.

Bi vê şevîniyê

Hawara wî weke loriyan deng dide

Hawara bendiyekî tik û tenê.

Ew çend rojên destpêkê baştir bû, lê ji serê vê sibehê pê ve termê bavê min bêhn girtiye. Gelek nexweş e, gelek zehmet e, ez bi vî awayî behsa bavê xwe bikim, behsa termê wî bikim, lê ez çî bikim, wiha ye. Niha ew termek e bêhn jî girtiye. Bêhna wî ne ji wan bêhnan e mirov xwe lê neban bike û guhê xwe nedê, bêhneke tûj û giran e, ez wisa his dikim genî bûye, di nav demar, rah û masûlkeyên min de jî belav dibe. Ez bawer dikim ji kesekî din re ev bêhna ha gelek girantir e, gelek nexweştir e. Ji bo ko termê bavê min e, ez nikarim, ez newêrim, ji dil bêjim, bêhna wî wiha ye. Ji bilî vê jî ez naçar im bi vê bêhnê re, bi vî termî re bijîm, lê kesekî din, dikare jê dûr bikeve û xwe jê rizgar bike. Kesek nayê xwe bi zorê bi bêhneke wiha gêj û har nake. (Wêne: Ferhad Shakely)

Di destpêkê de her tenê termek bû, termekî hişk û req, ko çiqas diçû girantir dibû û hilgirtina wî zehmet dibû. Wî ez gelek aciz kirim, mirina min hat ber çavê min, lê çî hal be min ew gihand vir, min ew gihand vî ciyê ha. Ê ji niha şûn ve ez ê çî bikim. Çî li wî bikim û çî li xwe bikim!!

Ew êvara em ketin rê, bavê min spî û sax bû. Qet nîşana nexweşiyekê û aciziyekê pê ve diyar nebû. Bi xwe his bi tişteki nedikir û min jî tişteki jê dernexist. Ez nizanim ji bo çî pê xweş bû ji êvarê ve bikeve rê. Min hez dikir em beyaneke zû derkevin û em roja xwe ya yekê dirêj bikin û em çend qonaxan bimeşin. Wî bi awakî din lê nêrbû. Planê xwe bi awakî din çêkiribû. Wî dixwest em roja yekê zêde aciz nebin. Em êvarekê bikevin rê

û piştî şeş-heft saetan bigihîjin şikevtê. Vê şeva xwe li wir derbas bikin. Wî ev roja yekê ji bo xwe lê xweş kirin, ji bo perwerdeyî danîbû, ji bo ko ling û piyên me nerm bin û di hemû warî de em xwe ji bo wê riya dûr û dirêj amade bikin. Vêca bi rastî baş jî hesab kiribû, heger me wiha nekiribûya, wekî min lê binêrîbû, me wisa kiribûya, em difewitîn. Hê roja yekê em ê bi temamî aciz bûbûna û wê riyê çavên me bitirsanda. Lê nêrîna wî ew bû, ko em roja yekê xwe bi tu awayî nêzîkî acizî û zehmetiyê nakin, em li dijî wê riya dirêj û zehmet ranebin, tenê em ê xwe perwerde bikin û çav, dest, pê û piştî xwe, hemû ruhê xwe hîn bikin û em ê xwe ji bo roja pişt re û ji bo rojên bê re amade bikin.

Ev jî, ev fikrên han jî feydê nedan me, em careke din têkçûn. Careke din jî hemû tiştên me xera bûn. Di rastiya xwe de ew bi xwe têkçû, ne ez. Ew yeka ko nediket û nehatibû bîra yekî ji me, qewimî. Min bîra hemû tiştan dibir, lê bîra mirinê, bîra mirina bavê xwe nedibir. Ez dibêjim ew tê de çû, lê bi rastî yê tê de çûyî ez im, ne ew e. Ew mir û rizgar bû, lê yê çiqas barê giran ê vê dinê heye li ser milan e, ez im. Ez ew kes im ko çiqas barê giran ê vê dinê heye li ser milan e. Ew ez im ko serê dinê lê hatiye hev û ez nizanîm ez ê çî bikim. Cihêtiyeke şiklî ew e ko ew miriye û ez sax im, lê sed xwezî bi wî, sed xwezî bi hemû miriyan, qet nebe carekê dimirin û temam. Ez jî nebixêra ruhê xwe sax im û dijîm, lê çî heye hêviyek di dilê me de tune, ez tu ronahî ji tu milekî ve nabînim û nayê dîtin.

Bavê min pir zû mir. Min bawer nedikir ko wê mirina zû bêhnê lê biçikîne û wî têxe tengiyê. Ez behsa temenê wî nakim. Ez behsa wê dikim ko gelek zû ji taqet û qudûm ket û temam bû. Ji temen têra xwe xwedî temen bû. Di ser şêstî re bû. Germî û sermiya jiyane gelek dîtibû. Vê carê gelek li ber xwe neda. Roja me ya pêncan bû. Bi şev bavê min mir. Eger ew wê şevê bimaya û bigihîştî sibehê, em ê têketana roja şeşan, lê ew wê şevê temam bû. Mirina wî ji nişka ve bû. Rojên destpêkê pir baş bû, pir jî gurr

bû. Tenê roja dawiyê, roja pêncan, westiyayî dixuya. Min his kir ko ew wekî berê gavannavêje û pêş nakeve. Car caran radiwesta û bêhneke baş dida û vêca dikete rê. Ez jî ji ber dilê wî pêş nediketim, min nedixwest his pê bike ko ez pê hesiyame ew betiliye. Min jî xwe paş dixist û gavên xwe girantir dikir. vareke dereng bû me da newaleke kûr. Sorayî di asoyê rojavayê de nemabû. dî dibû em rawestin, dibû em çavên xwe li ciyekî wisa bigerînin ko em bikarin êvara xwe tê de bibin serî. Roja borî jî her me wisa kiribû. Wê êvarê bavê min ne wek carên din bû, rengê wî têk çûbû. Dema ko em li ber kendalekê rûniştin nefeseke kûr kêşa û tişteke negot, min dizanîbû jan û xemeke zêde û mezin di dil û hinavê wî de peng xwariye, lê ew ji wan nebû zebûnê û bêdesthilatî bi rûçikê xwe bide xuya kirin. Ez gelek pê ketim ko pariyek nan bixwe, qemçek av vexwe. Tişteke nexwest. Ji min re got, tu nanê xwe bixwe, ez niha tişteke naxwim. Negihîşt sibê. Her eynê wê şevê û eynê li wî ciyê mir. Mirina wî jî gelek ecêb bû. Min kesek nedîtibû wiha bimre.

Ev çar roj in ko ez bi termê bavê xwe re dijîm. Îro, vê êvara ha, ev şeva ha çar rojên temam e. Lê her tenê Xwedê pê dizane ew çi çar roj bûn. Ya hatiye serê min ne ji wan e mirov bikare neqil bike û ne ji wan e behsa wê bê kirin.

Eger min bizanibûya dê ev yek bê serê me û ez ê van rojan bibînim, min ne ev rê dida ber xwe û min ne xwe û ne jî bavê xwe tûşî van hemû bedbextî û malwêraniyan nedikir. Ma min ê çawa zanîbûya, ez ne falavêj im û ne jî xeybzana im. Min dizanîbû ko dê deh–panzdeh roj bikişîne û em ê bi xweşî bigihîjin qonaxa xwe. Bi rastî bavê min ji min pir hez dikir. Wî bi xwe ev rê hilbijart. Ez bi fermaneriya bavê xwe perwerde bûbûm. Ez ji gotinên wî dernediketim, ji min re bigota here ser wê bilindahiyê xwe bavêje xwarê, min ê xwe biavêta. Eger min ji vê hatinê hez nekira, min

dikarîbû ez wî bi awakî tê bigihînim, lê bi dilê min bû, loma ez bi tu awayî li dijberî bavê xwe derneketim.

Her şeva yekê dema ko me berê xwe da şikevtê, min his kir ko rewşa bavê min ne wek berê ye, dev û zimanê wî guherîne û bi awakî din bi min re diaxive. Hinek caran tenê em kur û bav bûn, kur û bavekî ko her çend em gelek nêzîkî hevûdu jî bûn, lê cardin sînorek di navbera me de dima, sînorek ko ne min dikarîbû ez jê derbas bibim û ne wî dixwest jê bibore. Niha, wekî mirov bêje bavê min îtaeta wî sînorî nedikir. Min ew wek dostekî dihesiband û pirs jê dikirin. Min yekser wisa hesiband ko dixwaze bi min bide fahm kirin ko niha êdî em du hevalên seferî ne. Em du rêwî ne û divê em xweşî û nexweşiyên xwe li hev parve bikin. Ay bavo can! Bila em ne pênc rojan, bila pênc salan bi hev re di rêwîtiyê de bûna. Bila hemû zehmetî û serêşî para min bikatana û bi tenê tu nemiribaya. Niha xemên min ne yek û didu ne, li milekî derdê herî giran ê mirina bavê min, li milekî din jî termê bavê min, bûye barekî giran û ketiye ser milê min. Rizgariya min jî jê tune. Ez ê çî lê bikim, ma qet dibe ez her wiha wî di vê çolê de di cîh de bihêlim, ez ê ji kê re di cîh de bihêlim û piştî çî?! dî ne di wî halî de ne ko bi poşmambûnê ji vî derdî re çareyek bê dîtin. Eger roja rêwîtiya me ya yekê, min bizanîbûya dê ev yek bê serê me, em ê gelek bi hêsani vegeriyana, ji ber ko em hê nêzîk bûn û dûr neketibûn.

Lê niha vaye em neh roj in di rê de ne û em gelek dûr ketine. Em neh roj in di rê de ne! Belê rast e, neh roj in, lê ne riya neh qonax rê ye, çunkî tenê ew pênc rojên em bi hev re bûn, hemû rojê, em riya qonaxek rê dimeşyan. Em ewqas rê dimeşyan, ko mirovekî dikarîbû rojekê bimeşe. Lê ji wê roja bavê min miriye heta niha min nekarîbû ez ewqas bimeşim, dema ko em bi hev re bûn, em baş dimeşyan û rê ji ber me dîçû, lê niha ew tenê bi min nabe, çunkî ez tenê me. Heger em bêjin ez ji ber tenêtiya xwe nikarim baş bimeşim, îhtîmal e ew ne rast be; li milekî, dema ko

mirov bi tenê be, zilamekî tenê bi serê xwe be, siviktir e û divê baştir bimeşe û paş de nemîne, li milekî din jî ez ne tenê me. Niha jî ez û bavê xwe bi hev re ne, her wek roja yekê û ew pênc rojên em bi hev re dimeşyan, lê niha êdî bavê min ne xwe bi xwe ye, belko termê wî ye, termekî ko bêhn girtiye û divê ez wî hilgirim heta em bigihîjin şûnewarekî, ciyekî. Vaye çar roj in ez û ev termê ha di rê de ne, lê ew riya em van çar rojan meşiyane, ne riya çar qonax rê ye. Îhtîmal e em tev bi ser hev riya qonaxek rê meşiyabin. Na. Yê ko dimeşe ez im, ne bavê min e. Ew termekî nû ye û nikare bimeşe. Termek e û bêhn jî girtiye. Lê divê ez bi xwe bimeşim, termê bavê xwe jî hilgirim û gav bi gav ji vî milî deynim milê din. Roja yekê hindik mabû ko ez bêhêvî bim û teslîm bim, ez gelek westiyabûm, ez nizamim çawa bû ez bi ser ketim! Ez wa dizanim ko her evîni û siyaneta min a ji bavê min re hat hawara min, heke ne ez ketibûm, lê çi heye ez rojên pişt re baştir bûm. Ew şeva bavê min mir, serê sibê serê dinya min li min hat hev. Ez bi şev raneketibûm, saniyekê jî xew neketibû çavên min. Ez li hemberî termê bavê xwe bûbûm reben û pepûk. Ez nav û navan re digiriyam û hinek car jî min dixwest serê min rehet bibe ko ez bikaribim bifikirim. Ne dibû. Min nedikariya ez tişteki bikim. Ez bê his û kerr bûbûm. Ez perîşan bûbûm. Min bîra razanê jî nedibir. Ma çawa li wê newalê, li wê çolê, li teniştê termekî, ew jî termê bavê min, xewa min bihata. Ez li benda derketina rojê bûm. Min dizanîbû ko eger roj derkeve, wê hemû tişt hêsantir be. Min wisa dizanibû her ew roj tenê ye û bes. Ez dikarim bi roj xwe bigihînim ciyekî, yan bavê xwe bigihînim ciyekî û bi awakî çareseriyekê ji term re bibînim.

Min wê şevê bi hezar halan derxist sibê, şeveke dûr û dirêj, şeveke tarî, şeveke tijî xem, rondik û girîn. Hinek car min wisa dizanî agir ketiye dilê min, hinavê min, qirika min. Car caran ez bi kul û dil digiriyam. Ez ji bavê xwe re digiriyam. Li ser termê wî digiriyam. Girîna min ne tenê ji ber ko

ew bavê min bû, ji cih û awayê mirina wî re bû. Îhtîmal e eger ew li mal bimira, ew li ser ciyê xwe, li ser nivînê xwe bimira, bi vî awayî eziyet nedida min. Ko di wê çolê de û di wê şeva tarî de, min bavê xwe bibîr dianî, min termê wî bibîr dianî, min bêkesî û bedbextî bibîr dianî, kiziniya janeke germ û tûj ji hinavê min dihat xwarê. Hawar ji min bilind dibû û ez bi kul digiriyam. Ez demek baş digiriyam. Pişt re hêdî hêdî girîna min disekinî û ez hêmin dibûm. Wî wextî min dixwest ez bifikirim, min dixwest ez bifikirim ka ez ê sibê çi bikim, min nedikarî, nedibû. Sibe hat. Ew sibeya ez bêsebir li hêviyê bûm û min dizanîbû her bi hatina wê dê deriyek li min vebe, hat. Lê gelek dereng hat.

Taze şefeqê avêtibû, berê hilatina rojê, min li dev û çavên bavê xwe nêrî, min niha êdî baştir û zelaltir ew didît. Kizîn ji cergê min hat, careke din girîne serê dilê min girt, girîneke ji carên din kûrtir, ji carên din germtir, gelek germtir. Perîşaniyê xwe berda ser rû û çavên min, ji zebûniyê, ji bêpariyê û ji bêdesthilatîyê. Ji wê jî bêdesthilatir, ji wê jî zebûntir ez bi xwe bûm. Em herdu jî bêkes û bêdesthilat bûn. Her wisa ez nû têgihîştibûm ko mirina bavê min çi li min dike; li ser rojên min ên niha û li ser dahatiya min jî. Min ew şeva xwe ya dirêj li pêşberî term bir serî, bêyî ko ez lê bifikirim. Min dizanîbû bavê min miriye, lê cardin wisa dihat pêş çavên min, wekî bêjin tiştêkî wisa neguherîbe. Ew her li ciyê xwe bû, ew ciyê êvarê ko me şeva xwe tê de derbas kir. Wê êvarê ji bo bîhvedanê li wir rûniştibû, ji bo şeva xwe bibe serî, niha jî her li wî ciyî, di şûna xwe de, raketibû. Lê niha bi awakî din bû. Min dizanî êdî bûye roj û dibê em biçin, dibê ez termê bavê xwe hilgirim, bibim û em biçin ciyekî din.

Dema ko êvarê me berê xwe da vî ciyê, min dizanî ew gelek westiyaye. Her bi zû ji bo raketinê ciyê xwe xweş kir. Ji raketinê re! Mimkun e ji bo mirinê ciyê xwe ji raketinê re xweş kiribû. Mimkun e pekiya bû dilê wî û wî jî xwe ji mirinê re amade kiribe. Min hez dikir ew bi axive, lê min dizanî

ji ber westandinê lê xweş e bîhna xwe vede. Yek û dû caran serê xwe li vî milî û li wî milî zivirand. Gelek rehet nefes distand, gelek li ser xwe bû, gelek bêdeng bû. Carekê bangî min kir, bi navê min bangî min kir:

– Belê, bavo can.

– Tu çi dikî...?!

Min fikir ko ez bersîva wî bidim, min bala xwe dayê ew destê ko di dema pirsaxwe de hinek bilind kiribû, nizm bû û ket teniştaxwî. Ez ber bi wî ve çûm. Min baş bala xwe da ser û çavên wî, min li singê wî nêrî ka gelo di dema nefes sitandinê de radibe û rûdine yan na?! Bavê min miribû. Bê his, bê deng û bê hereket. Mimkun e eger yekê din di ciyê min de bûya, bawer nedikir, nedixwest bawer bike, lê ez yekser tê gihîştim, her yekser min zanîbû ko ew miriye. Bi hemû tiştî ve diyar bû ko miriye. Ew ji wê nebû ko ez ber bi şaşiyê ve bibim, yan şikekê ji min re çêke.

Ji wê rojê, ji wê seetê şûn de tiştêk di dilê min de bû girê; gotina wî ya dawiyê ko guhê min lê bû, ji pirsaxwe de, mebestaxwî çi bû? Gelo wî wextî pirsaxwe fikir, di dema pirsaxwe de, ez bi çi ve mijûl bûm û min çi fikir, an mebestaxwî ew bû ji wir şûn de, ji bo dahatû û ji bo pêşerojê, ez çi bikim û niyeta min ew e ez çi bikim!!

Bavê min bi vî awayî bû. Berê jî wisa bû. Gelek caran gotinek digot, min nedizanî mebestaxwî çi ye. Gotin bi awakî wisa digot ko mirov dikarî bi çend awayan tehlîl bike. Pişt re qasek şûn de, yan ez hêdî hêdî bi mebestaxwî gotina wî digihîştim, an bi xwe careke din bi gotineke din û bi awakî din ez tê digihandim, lê vê carê êdî ne wisa ye. dî ew tune ko min têbigihîne. Ez jî heta roja bimirim, ez ê di dilê xwe de bibim û bînim û bi hemû awayî tehlîl bikim. Feydeya wê jî tune. Eger ez rast jî tehlîl bikim, êdî ew nemaye ko heta dilê min xweş bike ko ez baş tê gihîştim yan na.

Bêyî ez bifikirim, her eynî wê sibê, min biryar da ez bimeşim; termê bavê xwe hilgirim û bimeşim. Min dixwest herçî hê zû ye ez ji wê newal û

kendalê derkevîm û bikevîm ser rîya xwe û bimeşîm. Min destê xwe avêt termê bavê xwe û ew hilgirt, min ew bi himbêzkî hilgirt. Ne gelek giran bû. Ez hêdî hêdî bi çêle û çepên newalekê ve derketim jorê. Li jorê deşteke fireh, hişk û rast û rewan hebû, rîyeke pahn di rexê newalê re derbas dibû. Min bi yek bêhnê term hilgirt û heta ez negihiştim ser rê min ew danenî erdê. Lê nefes li min çikiyabû. Min termê bavê xwe li wir hêdî hêdî danî ser wê erda hişk û ez bi xwe jî li tenîştê wî rûniştim. Ez di dilê xwe de ketim fikra hezar û yek bîran. Baş e ez ê niha berê xwe bidim ku, ez ber bi kîjan rîyê ve biçim. Di destpêkê de em ber bi kîjan rîyê ve diçûn, niha jî her cardin ez ber bi wê rîyê ve bimeşîm an ez bi paş de vegerim? Gelek ecêb bû ko beriya ez term hilgirim û ji kendalê derkevîm çawa ez nefikirîbûm. Bêyî ez bizanim ez ber bi ko ve diçim, min ew term ji bo çî hilgirtibû.

Min nizanîbû ez ê berê xwe bidim kîjan milî, ez vegerim, ew rîya ko em pê de hatine, ez bi paş de vegerim, an ez her dewam bikim û bimeşîm. Di destpêkê de dema ko me dest bi meşa xwe kir, em ber bi vî milî ve diçûn. Lê wî wextî ez û bavê xwe bi hev re bûn. Wî ev rê hilbijartibû. Bi xwe gotibû em ê ber bi vî milî ve bimeşin. Niha bavê min miribû, wî ne dikarîbû rîyek daniya ber min, ne jî dikarîbû bêje tu ê wiha bikî. Niha dibû ez bi xwe biryar bidim. Biryara yekê ya piştî mirina bavê xwe bidim û wê bi cih bikim. Ev ji min re ne hêsan bû, ez ko bi fermanên bavê xwe perwerde bûbûm, êdî kesek tunebû ez guhê xwe bidimê û bi gotina wî bikim. dî dibû ez bi xwe biryar bidim û bi xwe jî bi cih bikim. dî diviyabû ez bi xwe rê bibînim. Ez fikirîm ko bi paş de vegerim, her di eynî rîya ko em tê de hatibûn de, bi wî awayî jî ez ê paş de vegerim, em vegerin; ez û bavê xwe em çawa hatibûn, em ê bi wî awayî jî vegeriyana, her eynî di wê rîyê de, lê vê carê dibû tenê ez rê hilbijêrim, çunkî bavê min miribû, êdî niha termek bû, diviyabû bê hilgirtin û ciyê wî bê guhertin. Min dizanîbû eger

ez di wê riyê de vegerim, pênc roj rê li pêşiya min in. Lê ew pênc rojên ko em herdu meşiyabûn, ez û bavê xwe, em meşiyabûn, niha diviyabû, ez termê bavê xwe jî hilgirim. Ne tenê pênc rojan, ez panzdeh rojan jî nedigihîştim ew ciyê ko em jê hatibûn. Vêca çima ez ê vegerim?! Bavê min bi xwe ev riya ha hilbijartibû, wî bi xwe dixwest em di vê riyê de bimeşin, niha jî divê ez li gor wî bikim. Ez ê her bimeşim. Ez nizanim divê ez çiqasî bimeşim, dê ji min re û ji me re çiqas bidomîne. Min nedizanî em ê bigihîjin ku, divê em bigihîjin ku; lê diviyabû em bimeşin, ji vir dûr bikevin, diviyabû ez bigihîjim ciyekî, bavê xwe, termê bavê xwe, bigihînim ciyekî.

Min termê xwe hilgirt û ez ketim rê. Cardin min himbêzkî hilgirtibû. Min herdu destên xwe li navtenga wî alandibû, ser û milê bavê min diket ser milê min ê rastê. Bi vî awayî meş nerehet bû. Gelek caran bêyî ez ber pê xwe bibînim ez dimeşiyam. Baş bû ko rê rast bû, tirs a ketinê tunebû. Min nikarîbû ez bi vî awayî bidomînim. Bavê min ne zêde giran bû, termê bavê min ne ewqas giran bû, lê cardin ez diwestiyam, diviyabû ez wî car caran daynim erdê û bêhneke baş bidim, pişt re ji nû ve hilgirim û bikevim rê. Heta nîvroyê û heta qasek piştî nîvroyê jî bi vî awayî ez di rê de bûm, ez qasek dimeşiyam û pişt re min termê bavê xwe datanî erdê û bêhneke baş dida. Min dixwest bi van bêhnvedanan hêz û taqetek bê ber min û cardin bikevim rê... Lê piştî nîvroyê, êdî taqeta min nemabû; bêxewiya şeva borî, birçîtî, girîn û xem û hilgirtina termekî, termê bavê xwe. Min dizanîbû ko ez dikim êdî ji çeng û baskan bikevim, ji herdu ejniyên çokên min ji ber arhanê jê tîr dibarîn. Ez gêj dibûm û car caran ko piştî bêhnvedanê min dixwest ez rabim piyan, çavên min reş dibûn. Di dema meşê de jî hinek caran ez nîvruhî dibûm. Min dizanîbû nabe ez bi vî awayî bidomînim, ez nikarim bi vî awayî bidomînim, divê ez li ciyekî rawestim û ji vê zêdetir neçim. Diyabû ez rakevim û bêhneke baş bidim,

ji bo ko ez xwe ji rojên bên re amade bikim. Ne dibû ez hema bi yekcarî rawestim û term daynim erdê, diviyabû ez bigihîjim ciyekî, penayek, bikarim şeva xwe lê derbas bikim. Li wan nêzîkahiyên ne newal û ne jî kendalek hebû, tenê li dûr, girek, girekî biçûk dihat dîtin. Diviyabû ez bigihîjim wir, termê bavê xwe bigihînim wir û vê şeva xwe li wir derbas bikim. Lê heta ez gihîştim wir û heta ez hilatim jorê, ruhê min ji pozê min hat xwarê û min hezar caran daxwaz û xweziya mirinê kir. Min hizir dikir ko ez ê zû bigihîjim wir û pişt re ez ê baş bêhna xwe vedim; lê çi heye ez êvareke dereng gihîştim ber pêşkên wî girî, serkevtina wê ji tevan zêdetir ez westandim. Gir ne ewqasî bilind bû, lê min nikarîbû ez digel termekî pê ve rapelikim. Diviyabû ez bi awakî din term hilgirim. Ji beyana sibê ve bû ko ez ketibûm rê û min term bi himbêzkî hilgirtibû. Niha ko min dixwest ez derkevim jorê, giraniya term bi awakî wisa diket ser milê min ko ber bi jêr, ji jêr ve min pal dida ber. Eger min zêde hewil nedaya min dikaribû ez bikevim xwarê. Min vê carê ew pişt kir. Di temamê jiyana xwe de cara yekê bû ez bavê xwe pişt dikim. Pir nexweş bû, pir zehmet bû. Nayê bîra min ko bavê min di saxiya xwe de hatibe piştkirin. Ez dizanim mirovên mezin ên bi temen û zarokên biçûk, ji bo ko ji av û çeman bên derbas kirin, tên piştkirin. Ev li ba min ne ecêb û zehmet bû, lê çi heye niha hilgirtina termê bavê min bi min gelek giran dihat. Xwezî min bavê xwe bi salan bi zindî bidaya piştta xwe. Lê ez naçar nebûma di vê kurteriya han de termê wî bi vî awayî hilgirim.

Li serê gir, yek-du komên ji keviran hebûn, kevirên biçûk û mezin komî serhev kiribûn û teniştta wan çal bû, erd bi awayî goreke teng, wekî sengerek hatibû kûr kirin. Li gor min ew ji bo çeperan bi xwe hatibûn çêkirin, lê ne çeperên şer, çeperên nêçîrê, bi vî awayî ko nêçîrvan di wê çalê de xwe veşêre û lûleya tivinga xwe têke nav keviran, an deyne ser keviran, nêçîrê bike. Bêyî ez bifikirim min termê bavê xwe danî nav

çalekê. Mimkin e ji ber ew çal wekî goran hatibû kolandin, gor dianî bîra mirov.

Min nikarîbû ez li rex termê bavê xwe rakevim. Pir xewa min dihat, ez pir westiyabûm. Min dizanîbû divê ez baş rakevim, toleya bêxewiya şeva borî û acizîya îro vekim. Ez rabûm û çûm û min xwe li rexê koma kevîran berda erdê. Min his dikir ko min bavê xwe tenê hiştiye. Min wisa dizanî ko ew koma kevîran sînorek e ketiye navbera min û bavê min. Li gor min wisa bû ko bi vê dûrketinê ew rêz û evîna min a li hemberî bavê min kêmbûye. Lê diviyabû ez rakevim, diviyabû ez baş rakevim, ji bo ko ez sibê baş bimeşim, ji bo ko rojekê zûtir termê bavê xwe bigihînim ciyekî.

Dema ko beyana sibê ez ji xew hişyar bûm, tirseke ecêb ez girtim, tirseke bê mîsal, temamê bedena min dilerizîya. Min çawa karîbû, min çawa wêrîbû wî termî, termê bavê xwe, wisa bi tenê, di wê çolê de, di cih de bihêlim? Çawa dilê min razî bûbû?! Wisa dixuyê ji ber westandinê min melheza tişteki nekiribû, baş e eger dirindek, cinawurek, termê wî xwaribûya, yan perçek jê vekirîya, dê niha min çi kiribûya! Wê çaxê diviyabû heta mirinê min li xwe loman kiribûya; lomên kêmhîşiyê û kêmjîriya xwe bikim. Tişteki bi termê bavê min nehatibû, lê bi bîranîn, bibîranîna wê ko îhtîmal bû tişteki lê bihatiya, ji serî heta piyên min ez dilerizandim. Hinek mûrî (mûristang) li ser term bûn, li ser kincê bavê min diçûn û dihatin, ew gelek bi hişyarî diçûn, car caran jî disekinîn, wekî tu bêjî bêhna xwe vedidan û pişt re cardin diketin rê. Min bi nêrîneke bi rûmet li bavê xwe nêrî, min guherînekê tê de nedît. Li gor min hinek, gelek kêmbû, ji berî mortir dihat xuya kirin.

Wê rojê ez qederek meşiyam. Ez nizanim ez çend saet û çend qonax meşiyam. Lê ji bo ko ez newestiyabûm û şeva beriyê ez baş raketibûm û min bêhneke baş dabû, ez rehetir dimeşiyam û term hêsantir dihat hilgirtin. Diyar e ez seranserê wê rojê wisa nebûm; ez tenê danê sibê

gurtir bûm û pêwistiya min zêde bi rûniştinê û bêhnvedanê tunebû. Piştî nîvro yê min his kir ko navmilên min û baskên destê min diêşin, piştî min, piştî maziya min eziyetê didin min. Lê cardin ez nesekinîm, heta dereng, heta êvareke dereng di rê de bûm. Diyar bû ko ez ji ciyê xwe yê do gelek dûr ketibûm, çunkî ev ciyê ha bi dar û av bû, hêşintir bû. Giya, tewrî û deviyên biçûk li herdu milên rê hebûn û çiqas diçû zêdetir jî dibûn. Bi eksê do, îro qet bêhna min jî teng nebû. Do car caran min xwe bi xwe fikra bavê xwe dikir û li jiyana, li bêçaretî û bêkesiya bavê xwe dikir, kelên girînê dihatin min û rondik ji çavên min dihatin xwarê, lê çi heye wisa dixuya ko îro ew hemû ji bîra min çûbûn; ne girîna min dihat, ne gunehê min bi min û ne jî bi bavê min dihat û ne dilê min tijî dibû. Heta min his dikir ko ew tirs û sawa termê bavê min a do hebû, îro nemaye... Dema ko ez ji bo bêhnvedanê rûdiniştim min term bê xem datanî erdê, bêyî wekî do, gelekî lê hişyar bim û guh lê bim ez çawa wî didanim erdê.

Roja sisiyan min bêyî gotin, biryar da ko êdî ez wî hilnegirim. Şev sar bû. Ez çend caran ji ber sermayê hişyar bûm. Min xwe baş pêça bû, lê cardin jî ez dicemidîm. Serê sibê hemû bedena min diêşiya. Min dizanî ko êdî ez nikarim termê bavê xwe hilgirim. Diyarbû ez riyeke din bibînim. Bi çi awayî dibe bila bibe gerek e ez wî bigihînim ciyekî, ciyekî dûr, ciyekî ko ji vir gelek dûr be. Yekser min melheze kir ko divê ez bi çi awayî be tiştêkî peyda bikim, tiştêkî durust bikim, vî termê daynim ser; darbestek, kaşedarek û bi vî awayî ez dikarim wî di pê xwe de kaş bikim. Min dizanî ko eger ez wiha nekim ez ê li ser destan bimînim û ez nagihim tu cî.

Li van nêzîkahyan tiştêk nedihat dîtin ko bi kêr bê ez tiştêkî jê çêkim. Lê do serê êvarê, berê ez bigihîjim vir, ez li nava qamîş û daristanekê re derbas bûm. Ew tiştên ji min re lazim in li wir bi dest dikevin, dibê li wir bi dest bikevin. Min nedizanî ez ê çi ji termê bikim. Ji xwe nedibû ez wî ji nû ve hilgirim û riya du seetan paş de vegerim. Eger min bixwestiya jî min

nedikarî ez wî li seranserî wê riyê hilgirim. Dibû ez wî di cih de bihêlim. Her eynî li wê çolê, heta ez vegerim di cih de bihêlim. Min nedizanî dê çiqas bikêşe. Qet nebe dê şeş–heft seet lê biçê. Dibû ez van şeş–heft seetan term li vê çolê di cih de bihêlim. Ez gelekî ditirsiyam tiştekan bê serî. Çima divê tiştekan bê serî? Ji xwe do êvarê jî ji bo raketinê ez gelek jê dût ketibûm û min ew jî her di cih de hiştî bû. Heta beyana sibê ne min serekî lê da û ne jî agahê min lê bû.

Min ew di cih de hişt û ez çûm. Ez danê nivroyê vegeyriyam û min darên darbestê bi xwe re anîn. Darên darbesta çî, du darên bi girê yên qahîm û hatibûn rastkirin, li herdu seran û naverasta wê, li çar–pênc ciyan meliyên qamîşan li ser hatibûn raxistin û bi şivên nerm pê ve hatibûn girêdan. Dima merdîwen. Merdîwenek ko lingên wê qasek ji hev dût bin. Min piştiniya bavê xwe ji piştî wî vekir, feyda wê hebû. Min paltoyê wî derxist û termê xwe danî ser darbesta xwe. Min palto bi awakî wisa li ser raxist ko ser, çav û rûyê wî bigre, pişt re min bi piştîniyê baş bi darbestê ve girê da û îşk jî da. Min ewqas îşk dabû, term bi darê ve bûbû yek perçe. dî ez dilgerm bûm ko ez ê bikarim di pê xwe de kaş bikim. Min tenê dikarî ez serê darên darbestê bigrim, ji erdê bilind bikim û kaş bikim. Serê bavê min li aliyê serê merdîwenê bû, herdu piyên wî jî li aliyê herdu piyên merdîwenê bûn. Eger min bi vî awayî di pê xwe de kaş bikiriyayim, tenê herdu piyên darbestê bi erdê re kaş dibûn. Piştî bêhnvedaneke baş ez ketim rê û min term û darbest bi hev re di pê xwe de kaş kirin. Dema ko herdu lingên darbestê bi erdê re kaş dibûn dengê gelek nexweş jê dihat. Lê çî dibe bila bibe ji term hilgirtinê gelek xweştir bû, ji ber ko siviktir bû, gelek siviktir jî bû. Hêdî hêdî ez hînî deng û xişiniya daran jî bûm. Car caran ew destê min ê diqerimî, min ew diguherand, bi destê din dikêşa.

Bi vî awayî ez du saetan meşiyam, lê min his kir ko nava lepên min digizgizînin. Min term danî erdê, li nava destê xwe nêrî, berboq dabûn.

Berboqeke mezin. Min dizanî dê ew min aciz bike. Berê jî hatibû serê min. Dest ko berboq da, bi taybetî eger nava lepên te be, divê tu karekî pê nekî, hekene giranî dikeve ser û ew diteqe. Berboq eger beriya gihîştinê biteqe êşeke wisa dide dilê mirov te'rîfa wê ne mimkun e, bi taybetî eger hewayê sar lê bide, êdî wekî dil û milakê te wekî bi kêrê bê rewatin bi wî awayî lê tê. Tu çareya min tunebû. Demekê tenê min bi destê çepê kêşa, lê çi heye ew gelek zû qerimî. Min dît ko ev wiha nabe, ez gelek betilîm. Min dest fikra çareseriyeyeke din kir. Dastmaleke min a mezin hebû. Min anî her serek wê bi serê darekî darbestê ve girê da. Vêca min serê xwe tê re kir. Niha ew destmal diket ser singê min. Vê carê di ciyê destan de min darbest bi singê xwe dikêşa. Ev baştir bû. Ji bi destkêşanê baştir bû, ger çend giraniyeyeke zêde dixist ser singê min û car caran serê daran jî li navmilê min diketin. Qasekê jî ez bi vî awayî meşiyam. Nefesa min çikiya bû. Min gelek zêde xwîdan dabû. Min êdî nedikarî ez ji vê zêdetir biçim. Nêzîkî avabûna rojê jî bû. Es sî—çil gavan ji rê dûr ketim û min li ber palekê darbest danî erdê û ez rûniştim. Ez ewqas betilî bûm, bi rûniştinê re xewê ez girtim. Min melheza termê kir, termê bavê min, ez ji darbestê vekim û deynim ser erdê?! Ez ji ber çi jê vekim, ew ne sax e heta ez bêjim dê şev rabe û bêhna xwe vede. Her bi darê ve bimîne baştir e, ji ber ko bi vî awayî ji sibê re hazir e, pêwîst nake ez careke din bi girêdan û qahîmkirina wî ve mijûl bim. Ez dikarim yekser wî rakêşim û bikevim rê. Min term li wir di cih de hişt û hinekî ji wir wê ve min xwe berda erdê û ez raketim. Min serê sibê hêdî hêdî xwe da hev û xwe hazir kir ko ez termê bavê xwe hilgirim û bikevim rê, lê ez bizdiyam. Du—sê gav mabûn ko ez bigihim ba termê, min bêhnek seh kir, bêhneke tûj û giran. Min wisa his kir ko sing û gewriya min genî bûye. Termê bavê min bêhn girtibû. Gelek nexweş bû, gelek giran bû, ko ez bawer bikim termê bavê min bêhn girtiye. Bêhneke wisa jê dihat min nekarî ez heta ew ciyê ko ez hatibûm pê ve pêş ve biçim,

bêhneke wisa nebû ko mirov bikare xwe li ber ragire. Serê min gêj bûbû. Ev çi roj bû ez ketibûmê? Çima diviyabû ev hemû tişt bên serê min! Ji ber çi min di serî de fikra van tiştan nekiribû? Her eynî wê rojê, wê şeva ko bavê min mir, ji ber çi min fikra wê nekir ko ev term e îro be sibê be her dê bêhn bikevê? Term, nabe demeke dirêj ji derve bimîne, bi taybetî di vê çolê de û di vê riya dûr û dirêj de ko min dabû ber xwe. Min melheze kiribû, lê nedibû ez termê bavê xwe li vê deşt û çola xalî bihêlim, diviyabû ez bigihim ciyekî û bigihim avahiyekê. Niha jî li min xerab qewimî bû; beriya ez bigihim ciyekî, beriya ez bigihim avahiyekê, termê bavê min bêhn girtibû. Cardin nabe ez wî li vir di cih de bihêlim û biçim. Dê ez ê çi bikim, ez ê çi bi vî termî bikim! Çi bi vî termî bikim ko bêhn jî girtiye! Taze nabe ez wî wekî do û pêr hilgirim û bikişînim. Lê ji bo çi armancê? Ez ê bi ko ve biçim, bibim ku! Ez ê heta ko di pê xwe de bikişînim, ez ê heta ko bikarim di pê xwe de bikişînim!

Çiqas diçû bêhna term girantir dibû. Armanca min çi dibe bila bibe, divê carekê ez xwe li ber vê bêhna ha ragirim, ez xwe li hemberî vê bêhnê ragirim, hekene ez nikarim tu karî bikim. Divê ez bikarim xwe lê nêzîk bikim, heta ko ez bikarim çareyekê lê bikim. Min piştîniya xwe ji piştî xwe vekir û serekê wê bi darbestê ve girê da. Ev êdî çareseriyê dawiyê bû. Min dest bi kişandinê kir, lê min çiqas dikarî ez jê dûr disekinim. Min dizanî ev bi ser nakeve, çunkî eger ez bi vî awayî bikişînim, dê hemû darbest di ser erdê re, di ser rê re kaş bibe. Îca ew dikare çiqas li ber xwe bide, ez nizanim. Lê ez bi kişandinê dilxweş im, dê darbest biderize, ji hev û du bikeve û xirduxaşî be. Çareke din jî tunebû, diyabû ez wiha bikim, heta ez bigihim ciyekî baştir, ciyekî ji vir baştir û musaîtir be.

Ez ketim rê û min term û darbest di pê xwe de kaş kir. Bi saya piştîniyê ez pênc-şeş gav jê dûr bûm, feyda vê jî hebû, bêhn her dihat, lê hinek kêmtir bû. Term, îro ji do girantir bû, îhtîmal e ko hemû bi erdê re kaş dibû ji ber

wê ye. Deng jî guherî bû, do wextê min dikişand xişexiş jê dihat, dengê îro wekî teptepê bû.

Min nêzîkî du saetan bi vî awayî dewam kir, min his kir ko dengê kêşandinê jî guherî ye; xirexirek jê dihat. Min ji dûr ve li term nêrî, ji ber bêhnê min nedikarî ez nêzîk bibim. Min tiştêkî fehm nekir. Cardin ez ketim rê. Ez qasekî çûm, ew deng hê jê dihat. Ez sekinîm. Min serê piştîniyê danî erdê û ez ji dûr ve li çarmedorê termê zivirîm; yek ji wan çewên xwarê ko min pê meliyên qamîşê bi darên darbestê ve girê dabû, qetiyabû. Niha herdu piyên bavê min, lib lib, bi erdê re kaş dibûn. Li ser erdê û bi ser rê re, hem şûna serê herdu daran û hem jî herdu piyên bavê min dixuyane. Ev herdu serên vî milî û wî milî yên darên darbestê bûn, yê ortê jî yê bavê min bû. Min li bavê xwe nêrî, min dît ko tenê ferek sol di piyan de bû, fera din ketibû. Gelo li ko ketibe! Mimkun e hê di destpêkî de, ko xişexişê dest pê kir, ew ketibe. Li ko dibe bila bibe, ez ê êdî taze çi lê bikim; nexwe ji vir şûn ve ez ê biçim li pê ferekî sol bigerim. Min di dilê xwe de his dikir ko ev li hemberî bavê min sivikiyeke, ko bi vî awayî piyên wî yên rût ji derve, bi erdê re kaş dibe. Cardin min serê piştîniyê girt destê xwe û milê riya xwe girt. Pişt re, dema ko ez ji bo bêhnvedanê sekinîm, min dît ko fera sola din jî ketiye. Niha herdu piyên bavê min li ser erdê rût wekî du hişkedarên bûn.

Ji avabûna rojê re gelek nemabû, roj nêzîkî çiyê bûbû, ko darbest ji hevûdu ket. Hemû şax, qamîş û giyayên li ser perçe perçe bûn. Piştîni, piştîniya bavê min ko min pê term bi daran ve girê dabû, sist bûbû. Termê bavê min ketibû erdê. Ev hemû bi carekê li ser hev qewimîn. dî ez bi tamamî ji hêz û taqek ketim. Min êdî nedikarî ez ji vê zêde biçim, min êdî nedikarî ez term bikêşim, ji ber bêhna wî min nedikarî ez xwe nêzîk bikim. Li milekî ez gelek betilî bûm, min nedikarî ez bifikirim jî. Ez çûm, bîst gavan li milê din î rê rûniştim. Min nedizanî ez ê çi bikim, ez şeva xwe li vir derbas

bikim an qasekî din jî biçim! Ez çawan biçim! Gelo term li ber xwe dide ez wî bê darbest bi pê xwe ve bikêşim! Ev ciyê ha ji bo derbaskirina şevê ne musaît bû. Diviyabû bi çi awayî be, ez qasekî din jî biçim û ji vir dûr bikevim. Qet nebe ez term bigihînim besteciyekî û ji naverasta vê riyê dûr bixim. Lê ya ez ji hemû tiştî zêdetir jê ditirsiyam ev bû; çawa, ez ê ciyê vî termê çawa biguherînim?! Ez wî çawa ji vir dûr bixim?! Ez wî çawa bikêşim?! Min dizanî tu çara wê tune, divê ez mil bidim ber, karekî giran bikim. Ez li hêviya çi bûm?! Ez hêdî hêdî ber bi termê ve çûm û nêzîkî wî bûm. Diviyabû ez bêhna xwe bigrim û pozê xwe hişk bişidînim. Eger ez hê ji dûr ve bêhna xwe bigirim ez pê re nagihim bi bêhnekê xwe bigihînim termê û dar û qamîşan jê vekim û cardin jê dûr bikevim. Diviyabû ez hewil bidim çend caran biçim û bêm. Pênc–şeş gav mabûn ez bigihimê, min hişk pozê xwe girt û ber bi wî ve çûm. Cara yekê min destê xwe gihand darekî. Ew gelek rehet hat ber destê min û min ew ji piştîniyê, qamîşê û şivên daran kêşa û ez dûr ketim. Dema ko min destê xwe ji pozê xwe da alîkî û nefes sitand, gewriya min tijî bêhn bû, bi bêhna termê. Gelek ecêb e. Bêhn ne tişteki wisa e bê dîtin. Mimkun e dema ko mirov barek ar hilgire, ser û milên mirov di ar de bimîne û ar binîşe nav cil bergê mirov. Min wisa his dikir ko bêhn niştiye nav cil û bergên min û hemû ruhê min bêhn girtiye. Min liba darê din jî eynî bi wî awayî derxist. Tenê ma ko ez bikarim piştîniyê jî jê vekim. Qamîş û şaxên daran rehet bûn, bi xwe ji hevûdu ketibûn. Bi sê–çar caran çûn û hatinê min girêyên piştîniyê jî vekirin. Ez ji ber bêhnê gêj û şaş bûbûm, dilê min serûbinî bûbû. Min dikir ez vereşim. Diviyabû ez dûr bikevim û bêhna xwe bidim. Dema ko min ji dûr ve jî nefes distand, min dizanî ko ew hewayê paqij jî bêhn girtiye. Min di dema bêhnvedanê de melheze dikir, niha vê carê ez ê çi bikim; bi piştîniyê qahîm girê bidim û di pê xwe ve bikêşim, an dev jê berdim her di ciyê xwe de bimîne heta ez çarekê jê re bibînim?! Dema ko ez rabûm piyan min

rast milê rê girt. Min got ka ez carekê herim van derûdoran biceribînîm, ez bizanim ka ciyekî baştir bi dest nakeve. Ez demeke baş meşiyam. Nîv saet zêdetir bû. Ev meşa ha li min gelek xweş hat. Rê nerm bû. Niha ko min term jî nedikêşa, min his dikir ko ez virtî—vala dimeşim. Feyde tunebû; çunkî ciyekî baştir li ber çavên min neket. Diviyabû ez vegerim, biçim ba termê. Dunya bi temamî tarî bûbû, eger ez rê bi rê neçûbûma ez bawer nakim ko min bikaribûya ez bêm ba termê bavê xwe. Ez nizanim çiqas mabû ez bigihîjim balê, min his kir bêhna termê tê pozê min, ba ew dianî. Dema ko ez lê nêzîk bûm, êdî ko bi çav jî ferq dikir, min xwe ji ser rê da alîkî, sî—çil gav anji wê wêdetir ez rûniştim. Min nedizanî ez li hêviya çi me û ez ê çi bikim. Di vê tariya ha de tişteke jî nedihat kirin. varê min dixwest ez term qasekê ji rê dûr bixim, lê niha min dev ji wê jî berda. Bila her li wir be, heta bibe roj, wê çaxê divê ez zêdetir bikarim li ser tişteki bifikirim. Xewa min nedihat, xewa min revî bû. Min dizanî şeveke dûr dirêj li pêşiya min e. Ez naçar bûm, dudil bûm, westiyayî bûm, rastî reşayiya vê tarîşevê jî bûbûm.

Tu dibêjî ev tarîşeva ha firsetek bû li çarmedorê daristana mirinê hatiye kêşan; ciyekî li devê rê û rêbaran vekiriye, wekî çar çiqên darê, wekî devê goreyê û wekî serê rimê, ji milê jor ve jî te digot qey gidîşên reş in xwe li giyayên reş û tarî rapêçane. Ez li kîjan milî dinêrim tarî ye, pêl li ser pêlê, ji serî heta biniya erdê ez di nav bêagahî û nezanîne de me. Min dixwest ez vê perdeya sitûr a şevîniyê hildim û serê wê bikêşim nav razxaneya renga reng a rojan. Min dixwest ez bi destê xwe li ser nexşeya dahatû ya ne diyar nîgara rêçeriyekê bikêşim ji serê tilyên piyên min dest pê bike heta jorê, wekê nîlûferê, xwe heta serê çima herî bilind a xeyalê bialîne. Ya min didît heykela bîranîna ezîzekî bû di tabûta bêdengiyê de çavên xwe kiribû pençeyê stêrkan ê pirr hişyar ên ko ji jiyana wan nazik a sirûştî re dilorandin. Xeyal rayeleke şîn a hevrîşm bû, herdû serên zemanê bi

hev ve girê dida û li ber çavên me li dawîn kirasê şevê dialî. Xeyal termê pîremêrekî bû li rexê riyê ax, di çolevaniya şevê de, bê naz, ketibû; termekî bêhngirtî, bi şînebayekî têkelî nava bêhna xweş a şevê dibû.

Termê bavê min hê di ciyê xwe de bû, ji vir ve wekî topeke reş û xumam dihat dîtin, lê car caran bêhna wî digihîşt pozê min. Hemû li ser hev neh roj beriya niha bû ko em ketibûn rê, em ji bo armanca sefereke dûr û dirêj ketibûn rê. Wê çaxê bavê min bi rêk û pêk bû, gelek gûrr û geş bû, gelek jî dilgerm bû, lê çî heye niha termekî hişk û req bû. Termekî bêhngirtî bû. Niha ya ji bavê min maye ew topa reş bû ko ketiye rexê rê û van deveran tije bêhn kiriye. Bêhneke tûj û giran, ez wisa his dikim ko qirika min xitimandiye û belavî nava demar û masûlgên min bûye. Ew kesê li ser wê riyê ye ne bavê min e, termê bavê min e, termekî bêhngirtî ye. Nabe ez bêjim ew bavê min e. Bavê min mirovekî bi rêk û pêk bû û zindî bû, lê ew niha termek e, termekî bêhngirtî. Ez niha naçar im biçim. Divê ez wî li vir li vê çola ha bihêlim. Divê ez biçim û bigihîjim ciyekî, bigihîjim avahiyekê. Axir heta dunya ava ye ez li muqabilê termê destê min li ber rûyê min rûnanim. Eger feyda wê hebûya dê min bikiriya, lê ez dizanim bêfeyde ye. Ez dizanim ez nikarim wî bigihînim tu ciyekî, divê ez biçim û wî di cih de bihêlim, qet nebe hawara mirina wî bigihînim ciyekî ko qet nebe ev ciyê han ê serê duriyê dikare di bîra min de bimîne. Ez dibînim ko agahê kesekî, ji tu milekî ve bi me tune, ne ji min û ne ji bavê min. Me nû wî serî terk kiriye, lê em hê negihîştine serê din, tenê riyek li ber min maye; divê ez biçim, divê ez bigihim ciyekî, bigihim avahiyekê. Gelo niha ferqa min û bavê min çî ye? Tu ferqek me tune. Rast e ew miriye û ez sax im, lê agahê kesekî ji me herdukan jî tune. Heta ez negihim ciyekî ne mirina wî û ne mayina min tiştekî îfade nakin. Niha tenê ez dizanim ko ew miriye, lê kî dizane ko ez sax im!

Ji tîrmeha 1996an heta 06/01/1997an

Ji soranî: Elîşêr

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: FERHAD SHAKELY

Weşandin: 2005-06-29

Xwendin: 12197

**

Girtiyê şeva reş

» Firat Cewerî Di kerrîtî û tarîtiya şevê de, dengê fizîna bayê kurr, dengê fikîna têlên dîregên telefonan, tirseke bêhawe bi ser bajêr de dibarand. Di wê saetê de ji bilî polîs û leşkerên nobedar û ji bilî segên bajêr yê bêxwedî ko li dora dikanên qesaban diçûn û dihatin, kes tune bû. Wan di şeveke wilo de li deriyê te xistibûn. Bi teqîna derî re tu ji nava nivînan pekiyabû, te destê xwe avêtibû qutikê li ber serê xwe û tu rabûbû. Ger ne ji dengê jina te yê bi tirs û lertzokî bûya, te ê hema bi bazdan biçûya derî vekira. »Derî vemeke Selman, em ê pêşî ji polîsan re telefonê bikin« wê gotibû. Mîna ko te zanîbû mêvanên te yê bêwext polîs in, te bi lez bişkokên qutikê xwe girtibûn û te ji hundir »hûn kî ne?« bang kiribû. »Em in Doktor, derî veke, nexweşekî me heyê« dengên ji derve gotibûn. Herçiqas te gotibû, »destûra min tune ez nexweş û birîndarên nenas bi şev derzî û derman bikim« jî, peyayên ji derve bi celebekî deriyê te vekiribûn û ketibûn hundir. Bi dengên wan, zarokên we yê biçûk jî şiyar bûbûn, xwe li kirasê diya xwe yê şevê pêçabûn û geh li diya xwe, geh li te, geh jî li wê koma peyayên girs û nenas nerî bûn. Tu bi xwe şaş û ecêbmayî mabû, te çîrok fêhm nekiribû. Wan pêşî xwe mîna »hevalan«

bi te dabûn naskirin. Ji ber ko tu zarokê herêmê bû û te panzdeh salan li wî bajarê xwe yê biçûk doktorî kiribû, te piraniya rûniştevanên bajêr nas dikirin. Gava ew têgihîştibûn ko te ew nas kirine, wan xwe mîna polîsan bi te dabûne naskirin. Te pêşî li kaxiza wan ya destûrê pirsî bû, paşê te sûcê xwe meraq kiribû. Yekî ji wan kaxizeke qermiçî ji bêrika xwe derxistibû, ji dûr ve nîşanî te dabû, paşê dîsan bi lez ew kaxez xistibû bêrika xwe. Yê herî li dawiyê î bejinkurt, ko ji bo nexweşiya xwe ya zerikê carekê hatibû ba te, mîna ko ji bo li hemberî doktorê xwe bêhurmetiyekê dike, şerm kiribû, loma serê xwe xistibû ber xwe, qet li çavên te nenerîbû. Minaqeşeya we ya li ser lingan zêde neajotibû, wan destûr nedabûn, ko tu zêde bipeyivî, emir li te kiribûn û ji te xwestibûn ko tu bi lez kincên xwe li xwe bikî û bidî pêşiya wan. Te jî wilo kiribû. Berî ko hûn ji hundir derkevin, tu li ber derî di ser stuyê xwe re zîvirîbû, te bi awirên tijî mane li jina xwe nerîbû, te dabû pêşiya wan û li dolmîşa wan, ya li jêra hewşê sekinandîbû siwar bûbûn û ji malê bi dûr ketibûn.

Wan du caran tu li nava bajêr gerandibûn. Bajarê ko te piraniya emrê xwe lê buhurandibû, wê şevê bi te ecêb hatibû. Çavên te li serê her kuçeyekê li peyayên nenas û bi sîlah ketibûn. Gava wan tu ji bajêr derxistibûn û hûn ketibûn riya gundekî çiyê, tirseke mirinê li te peyda bûbû. Ji bo tu hebekî tirsaxwe bitemirînê û dilê xwe têxî cih, te dîsan ji wan pirsaxwe sûcê xwe kiribû. Yê ko li herî dawiyê rûniştibû û wê şevê jî berçavkeke reş li ber çavan bû, ji paşiyê de hutikek bi hêz li paş stuyê te xistibû û bi te dabû xuyakirin ko tu bi sûcê xwe dizanî. Tu bi lêdana wî pir li ber xwe ketibû, lê te li ber xwe dabû û ji wan re gotibû ko tu bi sûcê xwe nizanî. Gava dolmîşa we tibabekî ji bajêr bi dûr ketibû û şewqa elektirîkên bajêr ji ber çavan winda bûbû, tu li bûyerên van mehên dawiyê fikirîbû, loma tirseke bêhawe bi te girtibû, gomlegê te bi carekê ve ji xwêdanê şil bûbû. »Ez dixwazim hînê sûcê xwe bibim, hûn dikin min bi ko de bibin?» mîna ko tu

ne li ser hişê xwe bû, te pirsî bû. Minaqeşe û kurtûpistek bi nava polîsan ketibû, piştî çend deqîqeyan wan dîsan berê dolmîşa xwe bi bajêr ve kiribû. Şewqa elektirîkên bajarê te yê zaroktiyê dîsan hêviya jiyane dabû te, dilê te yê jar şa kiribû. Lê ew dilşahiya te zêde neajotibû. Dolmîşa we li ber deriyê avahiyeke mezin sekinî bû. Gava wan tu ji dolmîşê daxistibûn û biribûn hundirê wê avahiya mezin ya ji keviran, yekî li ber derî tavilê çavên te girê dabûn û paşê tu dehf dabû hundir. Bi dehfa wî re tu deverû ketibû erdê, lê wan dîsan bi milên te girtibûn û tu ji erdê rakiribûn. »Ma Doktor ev e?« yekî ji yê din pirsî bû. Te ji berdêla wî bersiv dabû »Erê, ez im« te gotibû û te texmîn kiribû ko êdî ew ê li hemberî te bi hurmet tevbigerin. Te gotibû »çawa be ez doktorê bajêr im, zarokan şaşitiyek kirine, ez girtime, lê ew ê niha min berdin û di ser re jî ew ê uzra xwe ji min bixwazin«. Hê tu wilo difikirî, yekî ji paşiyê de bi qemçika paş stuyê te girtibû, du caran serê te li dîwêr xistibû û gotibû: »Tu ê birîndarên wan derman bikî ha! Ka bila ew jî werin birînen te derman bikin!« Ê birîna te ya pêşî di laşê te de vedibû, xwîneke germ ji serê te herikîbû ser paçikê ber çavên te. Te li ber xwe dabû û te gotibû »ez bêşûc im«. Lê te nikarîbû bêşûcbûna xwe bi wan bidaya qebûl kirin. Te di tariya çavên xwe de ronahî û pakiya hundirê xwe dîtibû. Ê loma, ji bo ew guh bidin bêşûcbûna te, te bi dengê bilind û bi hêrs »Hûn bêqanûniyê dikin, ez bêşûc im« gotibû. Hêrsbûna te ew hêrstir kiribûn, ji her hêlê ve hutuk û pehîn li laşê te ketibûn. Te xwestibû tu xwe ji ber lêdanên wan biparêzî, lê bi lêdana yekî ji wan tiliya te ya girdikê fikiya bû. Te guh nedabûyê, ji hêrs û qehra bêşûcbûna xwe te êşa laşê xwe ji bîra kiribû. Wan jî êdî dev ji te berdabûn, tu çavgirtî li ser kursiyekê dabûn rûniştandin û yekî ji wan cigarek jî pêxistibû û dabû te. Te wextî cigara wî qebûl nekira, lê te xwestibû kurtedemek be jî tu teseliya xwe di wê cigareyê de bibînî. Tu di wê navbera kurt de li derengiya şevê fikirîbû. Tu li zarokên xwe fikirî bû.

Tu li diya wan fikirî bû. Lê dengên bang û xeberên wan tu veciniqandibû. Xuya bû hinin din jî anîbûn. Dengê girî û libergerînên yên nûhatî, yên zarokan bûn. Yekî ji wan digot »Wele haya min ji wan tune, ez çûbûm ser gora birayê xwe«. »Tu çûbûyî ser gora birayê xwe?« yê polîs jî digot û bi kulm û pehînan li lêwik dixist. »Hûn ê hemû wilo derewan bikin, hûn ê me bixapînin. Hûn ê hemû bidin dû hev û herin goristanê, herin ser gorên şehîdên xwe(!)«.

Mîna ew cara pêşî bû tu pê dihesiya ko çûyina ser gorên miriyan li bajêr qedexe bû. Te tehemul nekiribû. Te xwestibû tu ji ser kursiya xwe bipekî û bi dengê bilind neheqiya wan bi wan bidî zanîn. Hîn tu wilo difikirî, du heban bi milên te girtibûn û tu ji ser kursiyê rakiribûn. Wan tu pênc-şesş gavan meşandibûn û tu dîsan sekinandibûn. Te di bin paçikê li ber çavên xwe maseyek dîtibû. Li ser masê saetek, pakêteke Marlboro û kibrîtekê xuya dikir. Peyayê ko li ber wê masê bû ji te xwestibû tu bêrîkên xwe vala bikî ser masê. Te bi ya wî kiribû, te tavilê bêrîkên xwe vala kiribûn. Wî jî alîkariya te kiribû, destê xwe avêtibû qayîşa te û ew ji pantorê te kişandibû. Paşê jî wî saeta te û hungulîska te jî derxistibûn. Te xwestibû tu ji wî jî sûcê xwe bipirsî, lê te nepirsîbû, tu li bendî emrê wan rawestiyabû. Dîsan du heb, her yek ketibû bin milekî te û tu ber bi cihekî nenas ve biribû. Wê rewşa han herçiqas çavgirtînkî zaroktiya te anîbû bîra te jî, lê yên di milên te de tu ji xeyala zaroktiya te jî bi dûr xistibûn. »Xwe deyne, wê serê te li zikê avahiyê bikeve, hêdî bimeşe tu ê di avê wer bî. Kuro tu ket!« wan gotibûn û tu çend deqîqeyan wilo meşandibûn, ta ko wan tu avêtibûn pişt deriyekî hesinî, hundirê hucreyeke biçûk. Gava wan tu avêtibûn hundir, bê ko ew xwe nîşanî te bidin, wan paçikê li ber çavên te hilanîbûn. Di wê hucreya teng û gemarî de, mîna ko tu gihîştibû azadiya xwe, kêfa te hatibû. dî te dikarîbû bidîta. Çavên te vekirî bûn. Qîmeta ronahiyê li ba te bilind bûbû. Te xwe demekê di quncika hucreya

xwe de kiribû qomik û ziq li deriyê hesinî nerî bû. Li ser deriyê zingargirtî hin nivîs hatibûn xeritandin. Te demekê xwest ko tu wan nivîsan bixwînî, lê ew nedihatin xwendin. Te çend axînên kûr li ser hev kişandibûn. Tu di wê hucreya teng de li dinyayeke fireh fikirîbû. Ji bo ko tu jî carekê bi hin hincetan ji hin hevalên xwe re behsa girtina xwe û hucreya xwe bikî, te hêdî xwe berdabû ser çokên xwe û te hucreya xwe pîva bû. Hucreya te sê bihust di sisê û nîvan de bû. Tu demeke dirêj, heta ko lingên te tevizîbûn, li ser tûtikan rûniştibû û fikirîbû. Te carina bawer nedikir, te çavên xwe digirtin û te dixwest ko ew xewnek bûya. Te dinyayek xeyalên pak di wê hucreya xwe ya teng de çêdikir. Tu geh li ser tûtikan rûdinişt, serê xwe dixist nava herdu çîmên xwe, geh te xwe berdida erdê, te herdu destên xwe li çîmên xwe digerandin, geh tu radibûyî ser xwe, te piştta xwe dispart dîwêr, te destên xwe dixistin bin çengên xwe û tu demekê wilo li ser lîngan dimayî. Lê dengê barîn û qîrînên ko dihatin te, tirseke ko te heta wê demê his nekiribû, dixist dilê te. »Gelo ma ew ê li min jî wilo bikin« te di dilê xwe de gotibû. Ê te xwe ji wê re jî amade kiribû. Bi niyeta ko belkî ew te têxin felaqê, te di wê hucreya xwe ya sar û cemidî de sol û goreyên xwe ji lingên xwe derxistibûn. »Ger lingên min ji serman bitevizin, ez ê zêde êşê nekişînim« te di dilê xwe de gotibû. Ê ew ramana han jî ne ji ber şarezabûna te ya doktoriyê, lê belê ew li wir bi te re çêbûbû. Carinan di nav re dengên teperepa lingên mirovan, xeberên ne li rê, girî û libergerînan li korîdorê dihat. Carekê jî hema yek avêtibûn ber deriyê hucreya te. Ew ji serma dirikrikî, şingîniya diranên wî xweş dihatin te. Xuya bû wî gelek lêdan xwaribû. Gava te xuşîniya avê bihîstibû, te texmîn kiribû ko ew ava cemidî bi ser wî dadikin. Hingî bêhngirtin û bêhnberdana wî wilo bi lez bûbû ko te di dilê xwe de gotibû »Heger oksîjenê nedinê ew ê bimir«. Yê di wê rewşê de dixwest tiştinan bibêje, lê ji serma, lihevketina diranên wî destûr nedida. Di pişt wî deriyê hesinî û qalind de,

ew mîna sehneyekê dihat ber çavên te. Weke ko tu fikirî bû, kirin. Bi teperepa lingên çend mirovên din, doktorek jî hat. Ji bo bi hêsanî bêhngirtin û bêhnberdana wî, doktor jî jê re dibû alîkar. Di wê navê de pêla alîkariyê di dilê te de jî rabûbû, lê tavlê tirsî mirinê ketibû dilê te. »Ev çi dinyayek binerdî ye, ev çi jiyanek veşirtî ye« te di dilê xwe de gotibû. Ew celebjiyan zehf bi te ecêb hatibû. Mîna ko wê piştî kurtedemekê ruhstîn li deriyê te bixista û dawiya jiyana te bianiya, tu di hundirê hucreya xwe de bi aciziyekê bêtarîf geh rûdinişt, geh radibû. Piştî ko dengê yê li ber derî hatibû birîn û hatibûn ew biribûn, yekî bejinkurt, esmer û bi rih, deriyê te vekiribû, tepsiyekê tirşika fasûliyan û perçak nanê sominî avêtibû ber te. Tu li quncika hucreya xwe li ser tûtikan rûniştibû û te ziq li wê tepsîka xwarinê nerîbû. Kêfa wî ji wê tevgera te re nehatibû, »Te neciband Doktor beg?« wî bi qerf û bi hêrs ji te re gotibû. Gava te bersiva wî nedabû û te bi xayizbûn li tepsîka xwe nerîbû, ew hêrstir bûbû, lê zêde bi ser te de nehatibû. Ji ber ko te mereq kiribû, bê xwarina kîjan demê ye, te ji wî pirsî saetê kiribû. Ew dîsan bi ser te de qîriya bû »pirsî saetê qedexeyê« gotibû û ji ber ko wî nexwestibû dirêj bike, derî li ser te girtibû û çûbû. Te ew tepsîka xwarinê ber bi xwe ve kişandibû û demekê dirêj lê nerîbû. Tu birçî bû, lê te kiribû nekiribû dilê te nebijiyabûyê. Ji xwe gava dîsan dengê wê jinika li hucreya jêrî hucreya te hatibû, xwarin hew di ber te de çûbû. Jinikê ji deh panzdeh deqîqeyan carekê bi herdu destan ji hundir de li deriyê hucreya xwe dixist û bi dengê bi qêrîn bangî nobedaran dikir û pirsî lawê xwe ji wan dikir. Carinan nobedaran pê ve baz didan, bi hêrs deriyê wê vedikirin û xeber û gotinên ne li rê jê re dikirin. Lê nobedarê ko deriyê wê vedikir zû bi zû ji nav lepên wê nedifilitî û wê her pirsî lawê xwe dikir digot: »We lawê min kuştîyeee, we Mîrzeyê min kuştîyeee«. »Lawê te sax e, pîrê, tiştêk bi lawê te nehatiye« nobedaran jî bi tirkîyêke şaş û nexweş lê vedigerandin. Te

hertim li axaftina pîrê û nobedaran guhdarî dikir. Gava carekê pîrê ji yê nobedar re gotibû »Yox Wele sen yalan soyliyorsin« û hin çêr û xeber ji wan re dabû, tu bêî hemdê xwe di ber xwe de keniyabû. Û gava çavên te ji nişka ve li kêzika mezin ya di tacika xwarinê de ketibû, di wê kêliyê de li rûyê dinyayê çî xwarin hebûya, li ber çavên te reş bûbûn. Tu hema ji quncika xwe ji ser tûtikan hol bûbû û te bi hemû hêza xwe li derî xistibû. Nobedarek ji dûr ve ji dê û jina te re xeber dabû û bi hêrs ber bi hucreya te ve hatibû. Lê te lêdana xwe ya li derî domandibû. Tu wextî ji ser hişê xwe biçûya, lê tu dîsan bi ser xwe ve hatibûyî. Nobedarê bejinkurt î bi rih deriyê te vekiribû û bi ser te de qîriya bû. »Çî ye, tu çî dixwazî?« wî gotibû. »Vê xwarinê ji vir bibe« te gotibû. Mêrik bi dengê bilind bi te keniya bû, »Ha ha ha, dilê Doktor beg naçe xwarina me! Divê ji Doktor beg re xwarina taybetî çêbibe« wî gotibû û paşê bi carekê ve rûyê wî hatibû guhertin û bi hêrs bi ser te de qîriya bû. Te tu mane nedabû hêrsbûna wî, te hem jê nefret kiribû, hem jî gunehê te pê hatibû. »Dêmek tu bi şev birîndaran derman dikî, tu bi tirimpêla xwe diçî cih û deveran û birîndarên wan tînî li mala xwe derman dikî, ha!« wî dîsan gotibû, bi hêrs destê xwe yê rastê li sînga te xistibû û piştî te li dîwarê betonî xistibû. Gava piştî te li dîwêr ketibû, intîniyek ji te hatibû, mîna ko kezeba te ji devê te derketibe, te êşeke bêhawe his kiribû. Lê te li xwe dananîbû, te nexwestibû tu li hemberî yekî mîna wî xwe qels nîşan bidî, te peyva xwe birî bû, wî çî gotibû, te guh nedabûyê. Yê wî jî çî hatibû ber devê wî, wî gotibû. Gava wî rahiştibû firaxa te, derî li ser te girtibû û çûbû, yê di hucreya li kêleka te de li dîwêr xistibû û gotibû »Doktor, tu guh mede vî, ew li vir tenê firaxşo ye, ew ji vir e, lê ew xwe li ser serê me mezin dike, xwe bi tiştêkî dihesibîne.« Te pêşî ji wî dengî şiphe kiribû, te ew weke lîstikeke polîsan dîtibû, lê paşê te hêdî hêdî baweriya xwe pê anîbû. Te li cih û warê wî, li kar û mijûliyên wî pirsî bû. Wî tu nas dikir, carekê zaroka

xwe anîbû ba te, bi gotina wî te ji bo muayenê pere jê nestandibû. Lê nehatibû bîra te. Te di hucreyeke teng de, li pişt dîwarekî beton î qalind bi yekî ko te rûyê wî nedidît re, hevaltiyek, dostaniyek datanî. Sohbeta we bi deqîqeyan ajotibû. Wî di hundirê çend deqîqeyan de ji te re jiyana xwe ya bi salan gotibû. Dostanî û dilpakiya wî kiribû ko tu jî dilê xwe ji wî re vekî, jê re behsa çîroka jiyana xwe bikî. Te bi kurtî ji wî re behs kiribû û te bi wî dabû zanîn ko di çil û neh saliya xwe de ev cara yekê ye ko tu hatiya girtin û tu ji sûcê xwe bêhay î. Mîna ko hebekî bi mêrik ecêb hatibû, »Çawa tu heta niha ji destên wan filitî yî?« wî gotibû û tavlê bi ser ve zêde kiribû ko ew heta niha bi kêmanî çar caran hatiye girtin, carekê du salan û çend caran jî demên kurt girtî maye. Gava we ji dût ve dengê teperepa lingên nobedar bihîstibû, mêrik peyva xwe kurt birîbû û ji te re gotibû, ko li Şirnexê dikaneke wî ya wênekariyê bi navê »Foto Şîpşak« heye û heger tu bixwazî wî peyda bikî, tu dikarî wî li wê dikanê bibînî. Te gunehê xwe pê anîbû û rewşa dikaneke xwediyê wê bi salan jê dût be anîbû ber çavên xwe. Lê dengê teperepa lingên nobedar bi xurtî nêzîk bûbû û bala te ya xeyala dikana cîranê te belav kiribû. Tu tirsîyabû, ko îcar ew ê te bibin û îcar tu ê serpehatiya xwediyê wan dengên bi nalîn, bergerîn û bi feryat bijî. Lê wan vê carê bi şingînî deriyê hucreya kêleka te vekiribûn û xwediyê dikana »Foto Şîpşak« biribûn. Mêrik li ber xwe dabû, lê xuyabû yên ko hatibûn her yek ketibûn bin milekî wî û ew li dû xwe kişkişandibûn. An jî ji deng û tevgera wan wilo hatibû ber çavên te. Tu ji aliyekî ve gelekî li ber ketibû û te gunehê xwe pê anîbû, ji aliyê din ve jî ji bo ko wan tu nebiribûn, tu dilşa bûbûyî. Lê te tavlê ji ber wê hisa xwe şerm kiribû, tirsê û eziyetê egoîzma te xurt kiribû. Piştî ko wan yê di hucreya kêleka te de biribûn bi nîvsaetê, dengê borîna peyayekî di felekan re derketibû. »Hebe tune be ew e« te di dilê xwe de gotibû. Ê te di wê kêlîkê de ji mirovatiyê şerm kiribû. Te jî nizanîbû bê çima, lê tam di

wê navê de tu li çêbûna zaroka xwe ya pêşî fikirî bû. Ew hisên xweş yê ko pêlên hênik li dilê te xistibûn, te bi hemû bavan re parve kiribû. Tu li qîmeta insanekî fikirîbû û tam gava tu li qîmeta insanekî û insanetiyê difikirî, dengê teperepa lingên du peyan ji korîdorê hatibûn. Wan herdu peyan deriyê hucreya te vekiribûn, tu li qorziya rastê, destên te di bin çengên te de dîtibûn. Tu li bendî bû ko ew bi ser te de biqîrin û xeber û gotinên xerab ji te re bikin, lê wan bi tenê hêdîka her yekî bi milekî te girtibûn û xwestibûn te bi xwe re bibin. Tu jî qet li dij derneketibû, tenê te çavên xwe li ser wan gerandibûn û tu bi wan re çûbûyî. Te di bîra wan de anîbû ko divê ew çavên te bigirin, lê vê carê mîna ew hêrs bûbin, wan bi şidet milên te kişandibûn û tu biribûn odeya mezinê xwe. Te ew mezinê wan yê bejindirêj, çavşîn û rûbiken nas dikir. Ew çend caran ji bo hin nexweşiyên xwe hatibû ba te; te jî, digel ko te bi karê wî dizanîbû, ji bo ew biyanî bû, te qîmet dabûyê û te ew berî xelkê bajêr girtibû hundir. Gava ew di nav destên wan herdu peyayên girs û bi rih de çav li te ketibû, mîna ji bo ko wan tu bi wî babetî anîbûn, ew bi wan re hêrs bûbû, ji ser qoltixa xwe ya çermînî rabûbû û bi dostanî ji ber te rabûbû. Wê devbikenî û dostaniya wî dilê te şa kiribû, bê hemdî te rûyê te jî keniya bû. Wî destê te guvaştibû, tu dabû rûniştandin, cigare îkramî te kiribû û ji bekçiyê ber derî du çayê xwestibûn. Te du hilmên kûr li ser hev li cigarê xistibûn û mîna ko te dixwest tu gazinên xwe ji mezinê wan re bikî, te geh li wî nerî bû, geh jî te awirên xwe bera erdê dabûn û ji ber xwe şerm kiribû. »Zarokan tu bi şaşî anîne, Doktor« mîna ko ew jî li ber te ketibe, wî gotibû. Ê wî bi ser ve zêde kiribû, »Ji me re gilî hatiye ko te terorîstek derman kiriye, tu alîkariya wan dikî. Herçiqas min ji yê me re got, Doktor tişteki wilo nake, Doktor li gorî qanûnan diçe jî, lê yekî birîndar dibêje ko te bi şev ew li mala xwe derman kiriye«.

Te nizanîbû te ê çî bigota. Rast bû, te birîndarek li mala xwe derman kiribû. Şev nîvê şevê hinan li deriyê te xistibûn, li ber te geriyabûn û xwestibûn tu birîndarê wan derman bikî. Herçiqas te gelekî bi dîqet û bi tirs ji wan derî vekiribû jî, bêê ko tu ji wan bipirsî bê ew kî ne, tu bi saetan li birîna xortekî çardeh–panzdeh salî mijûl bûbûyî, te du gulle jê derxistibûn û te ew derman kiribû. Ew ne cara yekê bû ko şev nîvê şevê li deriyê te diket û alîkarî ji te dihate xwestin. Hema bêje, ji roja tu bûbûyî doktor û te li bajarê xwe dest bi doktoriyê kiribû, ne her şev bûya jî, bi kêmanî heftê carekê nîvê şevê li deriyê te diket û tu bi derd û kulên xelkê re radibûyî. Lê tenê carekê birîndarekî li deriyê te xistibû, ew jî digel ko te bi rewşê dizanîbû, dîsan te deriyê xwe jê re vekiribû û te ew xortê nûgihîştî ji mirinê xelas kiribû. Ê niha, gava wan ew xortê jihaldeketî anîbûn hemberî te, tu şaş û ecêbmayî mabû. Te xwestibû tu ji cihê xwe bipengizî, bi ser wan de biqîrî û bibêjî, vî xortî bibin nexweşxanê, lê tu bêdeng di cihê xwe de rûniştibûyî û te ji bêçaretiyê awirên xwe berdabûn serê pozikên solên xwe. Yê ko lawik anîbûn, bi ser wî de qîriyabûn: »Doktorê tu derman kir ev bû?« Te pêşî lawik nas nekiribû, ya Rebî, çî bi lêwikî hatibû? Ew bûbû mîna darîkekî, gepên wî kort bûbûn, porê wî yê zerik li hev geriyabû, ji xwe mirov digot qey newqa wî bi piştta wî ve zeliqiye, qutikê wî mîna ebayekê jê re fireh bûbû. Lêwik bi stuxwarî li te nerîbû. Ew dihejiya, bi zorê li ser xwe disekinî. Ne bi alîkariya herdu polîsên bi rih û rûtirş bûya, lawikê biherikiya erdê. »Ez ji te re dibêjim, doktorê ko tu li mala xwe derman kir, ev bû?« yê milê rastê bi şidet lawik hejandibû û jê pirsî bû. »Erê, ev bû« lêwik gotibû û bi awirin melûl û westiyayî li te nerîbû. »Temam, tamam, wî bibin« mezinê wan emir li wan kiribû. Wan lawik bi dû xwe de kişkişandibûn û biribûn. Tu sar mabûyî, te nizanîbû te ê çî bigota. Mîna yê ewqas sal xwendibû û dostanî bi ewqas kesên navdar re danîbû, ne tu be, tu di cihê xwe de mîna gundiyekekî saf, ji

dinyayê bêhay, bêdeng mabûyî. Mezinê wan cigareke din jî keremî te kiribû. Wextî te cigara wî negirta, lê te dîsan bêî hemdê xwe cigareyek ji pakêta wî kişandibû û bi hestê wî yê li ser masê pêxistibû. Te di nermî û dostaniya xav ya mezinê wan de derxistibû. »Lê Doktor, me ev ji te nedipa« mezinê wan gotibû û ji cihê xwe rabûbû. »Me ev ji te nedipa« wî dubare kiribû. »Tu dizanî bê tu çi dikî, Doktor?« wî bi dengekî hebekî sert gotibû, lê paşê mîna poşman bûbe, dîsan bi nermî bi ser ve zêde kiribû »Em dizanin mirovên nola te xwende û bîrbir tiştên wilo nakin«.

Te zanîbû bê ew di çi rewşê de bû û dixwest çi bibêje. Paşê ew li ser kursiyekê li ba te rûniştibû. Wî destê xwe dirêjî ser masê kiribû û rahiştibû wê albuma mezin ya qehweyî. Berî ew albumê veke »A ev e, Doktor, ev hemû hatine kuştin, dawiya vî karî ev e« wî gotibû û mîna ko bixwaze hîn bibe bê wan gotinên wî çi tesîr li te kirine, awirek avêtibû te, lê dîsan, mîna nexweze tu ji wê awirê haydar bibî, tavilê albuma di destê xwe de vekiribû. Te pêşî fêhm nekiribû, te mereq kiribû, bê ew dixwaze çi nîşanî te bide. Lê wî kursiya xwe hê bêtir ber bi te ve kişandibû û rûpelê pêşî yê albuma vekirî dabû ber çavên te. »A tu van dibînî, van li gundê N... du leşkerên me şehîd kirine, lê ma wê bi ko de xelas bibin, dawiya wan ev e«. Te kûr kûr li wî resimê bi reng, yê ko hema hema hemû rûpelê albumê girtibû, nerîbû û bêî ko di destê te de be, lerezekê laşê te girtibû. Wê yeka han bala mezinê wan kişandibû, lê mîna wî ferq nekiribe, ew tevgeriyabû, te jî tavilê di wê tevgera wî de derxistibû, lê dîsan jî te awirên xwe ji ser rêsim danegerandibû. Te di dilê xwe de mereq kiribû bê ew çawa û bi çi awayî hatibûn kuştin. Sê kes bûn, du keç û xortek. Yê xort mîna ko razayî be dixuya, tenê bin çavê wî yê çepê reş bûbû. Keçikek ji wan jî ji navê berjor tazî bû, hinek xwîn di nava pêsîrên wê yên nûgihîştî de herikî bû bin pišta wê, lê serê wê nexuya bû, bilûzê ko jê hatibû şeqitandin, pê rûyê wê nuxumandibûn. Te texmîn kiribû ko wê serê wê bi celebekî hatibe

jêkirin. Lê serê keçika din ko li jêrî lingên keçika rûnuxumandî bû, xweş diyar bû, çavên wê yên mezin vekirîbûn. Gava te bi niyeta belkî tu wê nas bikî, xwe nêzîktirî albumê kiribû, weke ew bi te re bişirîbû, te kenek li ser lêvên wê yên ji hev ferq kiribû. Mêrik rûpelê albumê qulupandibû. Vê carê komek termên mirovan li ser hev û du leşkerên mîna ko poz dabin kamerayê, li ber çavên te ketibûn. Mezinê wan hem digot, hem jî rûpelên albumê di ser hev re duqulupandin. Tu pê re nedigihîşt, bi niyeta belkî tu hinan nas bikî, her çiqas te bi dîqet li wan dinerî, lê heta nîvê albumê xelas bû jî, te hê kes nas nekiribû. Tam album li ber qedandinê bû, çavên te li lawikekî ko hertim ji bo gurçikên xwe dihat ba te, ketibû. Gava mêrik xwest wî rûpelî jî biqulipîne, te bi destê wî girtibû û careke din lê nerîbû. Erê, ew lawik bi xwe bû, resimê wî ji navê berjor hatibû kişandin, digel ko hin ji rûyê wî şewitî bû jî, dîsan te ew baş nas kiribû. Wê yeka han bala mezinê wan kişandibû, »Tu vî nas dikî, Doktor?« wî pirsî bû. Tu di erê nayê de mabûyî. Gelo te bigota çî? Hê tu difikirî, wî careke din ji te pirsî bû, »Erê Doktor, tu vî nas dikî?« Te derew kiribû, te bersiva »na« dabûyê, lê mîna ko te ji ber derewa xwe şerm kiribû, te serê xwe bera ber xwe dabû. Wî texmîn kiribû te ew lawikê ko belkî hê neketibû çardehsaliya xwe, nas dikir. Lê wî zêde guh nedabûyê, devê albuma xwe girtibû û dîsan danîbû ser masê. »Ev hemû ji aliyê hêzên ewlekarî ve hatine kuştin, nîvê wan ermenî ne, nesunetkirî ne« wî gotibû û bi dengê sert dîsan bi te dabû zanîn ko rabûna li hemberî dewletê ne hêsan e û wê dawiya hemûyan wilo bibe. Mîna kuliyan zimanê te xwaribû, peyv ji devê te derneketibû, te nizanîbû te ê çî bikira, te nizanîbû wan ê çî bikirana ji te, te nizanîbû tu ê bi çî celebî bi wî re bipeyiviya. Bêhna te teng bûbû. Tu bêçare bû. Te xwe di wê kêlîkê de şibandibû çûkekî baskokirî. Gava mezinê wan cigareyek pêxistibû, tu li bendî bû ko ew yekê bide te jî. Lê wî wilo nekiribû, pê li bişkokê kiribû û bi hêrs emir dabû hinan da werin

te bibin. Gava du kesên bi navmil û bi rih hatibûn, çavên te girê dabûn, bi milên te girtibûn û tu biribûn, te ew kirinên mezinê wan yên li hemberî xwe tavilê ji bîr kiribûn û te meraq kiribû ko êdî ew ê çi bikin ji te. Ji her derê dengê nalîn û libergerînan dihat. Wan tu bi çavên girtî dehf dabûn hundirê odeyeke sar, tu deverû ketibû xwarê, te li erdê jî ji serê xwe çend pehîn xwaribûn. Yekî bi dengê gurr û bi tirkiyeke xerab ji jina te re xeber dabû û bi te dabû zanîn ko ew ê çi bînin serê te. Ji xwe pir tê re neçûbû, tu şilfî tazî kiribûn, herdu destên te bi jor ve dabûn girêdan, çend satil av bi ser te dakiribûn û ji her hêlekê ve derbe li te ketibûn. Tenê te êşên pêşî his kiribûn, bêhî hemdê xwe tu qîriyabû, tu li ber wan jî geriyabû. Lê paşê weke tu têkevî xeweke kûr, te nema tiştêk his kiribû. Gava te çavên xwe vekiribûn, te xwe li ser textekî dirêjkirî dîtibû. Tu hê jî tazî bû, lê betaniyeke gemarî bi te hatibû dakirin. Tu êdî ji dangan vediciniqî. Wan tu dîsan biribûn, eynî tişt bi te kiribûn. Vê yeka han bi rojan ajotibû, ew tiştên ko te di pirtûk û rojnameyan de xwendibûn, hemû bi serê te de anîbûn. Tu hê jî dijiya. Te demekê ji wê jiyanê, ji mirovatiyê şerm kiribû, tu bêhawe li ber xwe ketibûyî. Hefteyek derbas bûbû, lê haya te jê tunebû, bi te mîna çend rojan hatibû. Te di wê hefteyê de ji bilî vexwarina avê tiştêk nexwaribû. Riha te ya ko te her sibeh kur fikir, dirêj bûbû. Porê te li hev geriyabû, çavên te kort çûbûn û binê çavên te reş bûbûn. Ger neynikek hebûya û te bikarîba li xwe binerîya, te ê bidîta ko mîna wî lawikê ko wan anîbûn pêşberî te li te hatibû. Zikê te bi piştê te ve zeliqî bû, heger qayîşa te li piştê te bûya, ji bo pantorê te ji te de nekeve, diviyabû te bi qulpuka herî dawî ve girê bidaya. Lê belê wan qayîşa te jî ji te standibûn û niha pantorê te ji te de diket. Te carê bi zehmetî partorê xwe dikişand jor.

Gava sibehekê deriyê hucreya te bi hêdîka vebûbû û wan tu bi çavên girtî bi dû xwe de kişkişandibûn, te texmîn kiribû ko ew ê dîsan te bibin odeya

îşkencê. Te xwestibû tu li ber wan bigerî, xwe biavêjî lingên wan, lê te nekiribû, tu bi înad di nava milên wan de meşiyabû. Gava wan tu xistibûn hundirê odeyekê û tu li ser kursiyekê dabûn rûniştandin, te ji dengên dektîloyan û di bin paçikê li ber çavên xwe de ji şewq û ronahiya hundir fêhm kiribû ko ew ne odeya îşkencê ye. Dengê ken û henekên wan yên fahş tu aciz kiribû, lê te nedabû xuyakirin, te destên xwe danîbûn ser hev û bi stuxwarî di cihê xwe de bêdeng mabûyî. Çend kesan gotinên ne li rê ji te re kiribûn, erza te şikandibûn, lê te dîsan tişt negotibû. Bi texmîna te yekî ko nuh ji derve hatibû, bi dengê mîna yê pîrekan ziravokî ji yên li wir re gotibû: »Haa, Doktor beg jî li vir e.« Bi gotina »begîtî« te dizanîbû wî henekê xwe bi te kiribû, lê tavilê dektîlonivîsê ko li milê te yê çepê rûniştibû, ji te nav û paşnavê te pirsî bû. Bi şertê ko tu peyva »komutanim« bînî serê her gotineke xwe, te nav û paşnavê xwe jê re gotibû. Wî li navnîşana te jî pirsî bû. Te ew jî bi eynî zimanî bersivandibû. Paşê wî li karê te, li navê dê û bavê te, li hejmara xwişk û birayên te, li malbatên xwişk û birayên te yên zewicî jî pirsîbû û bi bersivdayina te re bi şinge şing nivîsandibûn. Piştî wî pirsên xwe xelas kiribûn, wî ew kaxez bi te dabû îmzekirin û tu dîsan bi du kesan re çavgirêdayî şandibû hucreya te. Mîna ko tu hînî hucreya xwe bûbûyî. Te di wê hucreya xwe ya tengik de dinyayek xeyal çêkiribû. Te pir caran insan, insanetî bêmane dîtibû; gelek caran jî gunehê te bi insanan hatibû. Gunehê te bi te jî dihat. Carinan te his dikir ko hinek gunehê xwe bi te bînin tu ê bibêjî kûr û bigirî. Erê, mîna zarokekî bi îskîn bigirî. Ji ber her tiştî, ji bo her tiştî. Lê tam te belengaziya xwe bi bîr anîbû û girî ketibû qirika te, teperepa linginan hatibû te û xwediyê wan lingan, ko nobedarin nenas bûn, deriyê te vekiribûn û bi nermî ji te re gotibûn ko ew ê te berdîn. Te nizanîbû te ê kêf bikira an jî li ber biketayî. Te dabû dû wan û hûn bi hev re çûbûn hêwaneke mezin û sar. Li hêwana sar, komek xortên nekurkirî, bi awirên

melûl, reben, destên xwe danîbûn ser hev û li bendî tiştêkî rawestiyabûn. Tu jî bû yek ji wan. Tiştê ecêb, gava tu li girtiyan û li rewşa wan difikirî, mîna ko tu ne yek ji wan bî, te bi awerike din ew bi bîr dianîn. »Xwedê bike wan tu neêşandibin, Doktor« dengê ji milê te yê çepê hatibû. Tu hema li ser milê xwe zîvirîbû û te ziq li xwediyê wî dengî nerîbû. Te ew şibandibû, lê te nas nekiribû. Lawik zeyif bûbû, gepên wî kort çûbûn, newqa wî bi piştta wî ve zeliqî bû, kujê gomlegê wî yê ko ji ber pantorê wî derketibû, dilopin xwîne lê hişk bûbûn. Gava lêwik fêhm kiribû ko te ew nas nekiriye, wî navê xwe gotibû û bi te dabû zanîn ko ew li qehwexaneya hemberî doktorxana te kar dike. Hema di wê navê de, mîna birûskekê li mêjiyê te dabû ko di nava we girtiyan de wekhevîyek heye. Her kes ji azadiyê bêpar e, gotin û xeberên ne li rê li her kesî têne kirin. Lawik ji ber berdana xwe bi kêf bû, wî eziyeta xwe ji bîr kiribû, ew li te difikirî, heger bikarîba tiştêk ji bo te bikira, wî ê bi kêfxweşî bikira. Ew ji awirên wî diyar bû. »Piştî kontrolkirina doktor wê me berdîn«, wî bi heyecan gotibû. Gava di wê navê de yekî emir dabû we ko hûn ji bilî derpî hemû kincên xwe ji xwe bikin, diyaloga we jî hatibû birîn û lawikê çayger berî gişan kincên xwe ji xwe kiribûn. Çîmên wî yên lûlikî bêpirç bûn, mirov bi rehetî dikarîbû parsûyên wî bihejmartina. Gava çavên we li hev ketibûn, lawik bi te re bişirîbû. Pir tê re neçûbû we hemûyan kincên xwe ji xwe kiribûn. Her kesî ji hev fedî dikir. Ji serma hêwana mezin û fireh, hin ji we diricifîn. Gava doktorekî ciwan û çeleng bi aletên xwe yên doktoriyê hatibû kontrola we, te ji doktoriya xwe şerm kiribû. Ji ber ko tu li serî bû, wî pêşî tu kontrol kiribû. »Tu jî doktor î ne wilo?« wî bi tinazî gotibû û piştî ko tu kontrol kiribû, bi te dabû zanîn ko êdî tu dikarî kincên xwe li xwe bikî. Te hêdî hêdî kincên xwe li xwe kiribûn, alavên xwe yên ko wan roja pêşî ji te standibûn, bi paş ve standibûn, qayişa xwe bi qulpika herî dawiyê ve bi ser pantorê xwe ve girêdabû û tu derketibûyî derve. Li ber derî, mezinê

wan destê xwe dabû te, bi xavî bi te re bişirî bû û hêdî di ber xwe de, »li ser wî tiştê em peyivîn, bifikire« gotibû.

Gava tu ji hewşa polîsxaanê ya mezin, an jî bi gotina te, ya îşkencexaanê derketibûyî û tev li pêla mirovên bêmane yên li bajêr bûbûyî, te serê deqîqeyekê li paş xwe nerîbû. Azadî bi te xweş hatibû; lê jiyan, tevgera mirovan, kenê wan, xeberên wan, hemû bi te pûç û bêmane hatibûn. Gava yekî ji nişka ve xwe avêtibû te, tu veciniqî bû. »Tu hatî berdan, Doktor?« wî gotibû. Çaxa te dîtibû ko cîranê te ye, hebekî bêhna te hatibû ber te. Cîranê te tavi lê ji texsiyekê re fîkandibû, teksî bi bayê xwe re li ber we rawestiyabû, tu ketibû pêş, cîranê te ketibû paş û li gorî tarîfa cîranê te şifêrê texsiyê yê xort ber bi mala te ve ajotibû. Gava teksî ketibû kuçeya we ya fireh û herdu zarokên te ji nava wê qerebalixa li ber hewşa we bazdabûn pêşiya te, ji ber hisa bêrîkirin û hezkirineke bêsinor hêsir ji çavên te hatibûn...

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: FIRAT CEWERÎ

Weşandin: 2005-06-29

**

Hecî Mihemed Eliyê Qelşo

(Radiyellahû teala enhû)

“— Lê çawa, malava! Qey xortê niha jî bera xort in. Ferz e ew wisa dibêjin. Xortanî xortaniya heyama me bû.

Ez xortekî sivik î hê çardeh salî bûm. Ji efendiyê xwe re bêjim, min hê nû dil girtiye, bengî me, dûman ji nav serê min dikişe. Eysê, de Xwedê jê razî be, keçikeke wisa delal û xweşik e ko winda bibe tamamê keç û bûkê vê ebra me di mizgîna wê de dernakevin. Lê qîza kerê rû nade min. Tew li

siya min jî nanihêre. Ez tînim har bibim. Çawa ez ko ez bim, Mihemed Eliyo bim û dilê xwe bikimê û ev kafirbava ha xwar nebe û li siya min nanihêre?... Ev efendiyên ha cahil in pê nizanin, Melê min î delal! Lê te ji bavûkalan bihîstiye. Zemanê me, wekî vî zemanî ne berdîberdan bû: Eyb û şerm hebû, fedî hebû, hîcab hebû. Êh... min jî ji kal û rûsipiya, ji der û cîranan şerm e. Lê di nav dilê xwe de diqaqijim. Çi bikim çi nekim? A ko min nedî, wele rabûm ji bona sosreta giran min porê xwe berda. Porê min dirêj bû, bû kezî. Du keziyên dirêj, ha bi qasî zendikê min stûr ji paş re dihatin li binê qorika min diketin. Mêr, jin, kal, pîr digotin: ‘Mihemed Eliyo lawo ev çi hal e li te qewimiye? Te em hetikandin, bes e, şerm e êdî porê xwe jêke. Tu zilam î, porê xwe wek yê zilaman bike.’ Min serê xwe dihejand û di ber xwe de dibişirîm, guh nedida wan û diçûm.

“Bihar e... Hê gundî gişt di hundiran de radizên, derneketine ser xaniyan, lê ji kerb û wehcan tebata min nayê; ji bona hema sirf bîhna wê qîza kerê were min derdikevim li serbanê xanî radizêm. Xwedê tu ew Xweda yî lê gavê tu ne ew gav î: Şevêkê, du parê şevê çûye parek maye; carek bi deng û hêwirza gundiyan bi xwe şiyar bûm. Min guhê xwe dayê ko ji newala jêrîn a biniya gund deng û qîjîn û helahela gundiyan tê. Min ji xwe re got: Hela... hela... Xwedê xêr ke, ev hinekan avêtin ser gund talan kirin, ev çi bû? Wele hedin bi min neket hema sivik rabûm û min xwe di xaniyê du tebeqî de avêt xwarê û li êlama gundiyan, ber bi aliyê newalê bi bazdan çûm. Hê min riya xwe bi nivî nekiribû, elhemdûlîlah hewar xêr bû, gundî zivirîn, em rastî hev hatin. Lê çi? Kî rastî min dibe kenek pê digire, dikene û dibêje “hela bala xwe bidinê, hela lê binêrin!” Hingî ez dibêjim ‘kuro lawo çi biye, hûn çima dikenin?’ Ew bêtir bi min dikenin. Êh... damara hêrsê jî damareke pîs e, Melê min. Wele ez hatim hêrsê, min çavê xwe girt û devê xwe vekir ko tu avahiyek ji wan re nehêlim, rûsipîkî hema destê xwe danî ser devê min û gote min: ‘Mihemed Elî, berxikê min, çika

li ser milê xwe bizivire û binêre!’ Ez li ser milê xwe paşve zivirîm û min bala xwe dayê; wey la malikê tu xera nebî! bangeranê (lox) qiraseyê giran ê ser xaniyê me, bi herdû keziyên min ve li ser pişta min hişk negirêdayî ye?.. Ez di ber xwe de bişirîm, himmm! Welahînê Xwedê ev, hunerê wê qîza kerê yê Eyşê ye. Gundî hatin ko vekin ji ser pişta min deynin, min got: ‘Na! Li ber destê Xwedê ehd û wehd be, ev fêhlên wê qîza kerê ne, wê çawa bi wan destê xwe yên nazik hatiye bi keziyên min ve girêdaye, herwisa jî hetanî ko ew neyê dîsa bi wan destê nazik veneke, ewê ev bangeran a wisa li ser pişta min bi van keziyan ve girêdayî bimîne. ‘

“Lê... Melê min î delal! Di zemanê me de xort hebûn, hikmê xorta hebû. Dûrî ji civatê xortê niha jî ji xwe re dibêjin ‘ em xort in û me xortanî dît ‘, te got qey bera ew jî xort in.”

Hecî Mihemed Eliyê Qelşo (radiyellahû teala enhû) vê serpêhatiya xwe ji me re di civata li dikana Mele Mehmûd de digot.

Rojekî ji rojên Payiza paşîn a 1966 an bû. Piştî ji xwendegehê derketinê, me serîkî li qehwexanê xistibû, di pey de ez û Fikrî Xoce hatibûn aliyê çarşiya jêrîn. Bawer dikim jê re tiştê kirînê lazim bû. Lê li ber dikana Mele Sacid -ku Mele Mehmûd li nik dixebitî- Mele Mehmûd em vexwendin:

“— Mal avano! Ma dilê we di ber çaya me re nayê. Welleh hema ji min tirê keratî be jî ji bûna xatir divê hun min neşikênin.”

Mele Mehmûd hevlekî me yî hem dilovan û hem jî dilzîz bû. Ji bona neşikandina dilê wî em derbasî hundirê dikanê bûn. Em hê baş bi cih bûbûn-nebûbûn Mele Sacid jî hat.

Piştî bi cî kirina me, Mele Mehmûd derketibû ber derî û camêrekî dinê jî bi wî zarşîrînî û karoziya xwe anîbû hundir û bi me dabû nasîn. Ew camêr -himet û bereket hazir be- ew zat bû: Hecî Mihemed Eliyê Qelşo.

Di pey kêfxweşîdayina hevûdu, Mele Mehmûd; bi awakî taybetî ya xwe, gotin anîbû ser bikêrî an bêkêriya xortên îroyîn û ji cenabê wî halê xortên zemanê xortaniya wî pirsî bû. Li ser xwestina Mele Mehmûd Hecî Mihemed Elî dest pê kiribû û ev serbûriya xwe ji me re gotibû.

Piştî ko Hecî serpêhatiya xwe qedand, Mele Mehmûd got:

— Maşelah û subhan ji Xwedê re. Ew bangeranê qirase yê giran ko meriv pê xanî digêrîne li ser piştta te û bi keziyên te ve girêdayî, bi wî halî te ji serbanê xanî xwe avêt û heta newalê bazdayî çûy, gelo qet pê nehisiyayî ko wayê giraniyek li ser piştta te ye, ya jî giraniyek bi serê te ve daleqandî ye? Te qet têdernexist ?

Hecî bişirî û got:

— Camêr tu merivên berê û yên niha dikî yek? Xortên zemanê me bi şipil bûn, jêhatî bûn, bi destekî bangeran radikirin. Yên niha sistopisto ne, zilhimokî ne. Serê sibê hetanî evarê di kuçe û poxangê qesebê de wek hevîrê tirş bi hev de tirş dibin. Di wextê me de ref û nêçîr hebû, kevirê qewetê hebû, topenanê hebû... Ka tebatî bi me diket?

Fikrî xoce bi teqilandin jê pirsî:

— Nêçîrvanekî çawa bûy Hecî?

Hecî pirsî wi li cî nehişt. Bêî dudiliyekê bike bersîv da:

— Elî axa - ev Elî axayê me- nêçîrvanekî bêhempa bû, di wextê xwe de. Em jî gundiyê wî bûn. Hema wextê ko nêçîr hebiya ewê ji bajêr bihata , tevî gundiyê ko bi nêçîrê emel dikirin biçûna nêçîrê. Êh... qoce Elî axa ye... Mêrikê mezin e, bi tena serê xwe diçe derekê? Himin ewê pê re ji maqûl û hakimî çend kes hebin. Dîsa bi wî awayî carekê hat gund. Bi xwe re jî uzbaşî û çend mamûr û efendî anîne. Êvarê li dîwanê gote me: “ Karûbarê me bikin emê sibê herin nêçîrê.” Wele serê sibê ji wî serî de ez jî rabûm, min hespê xwe hazir kir û çûm ber deriyê koşkê. Elî axa û mêvan jî rabûbûn. Piştî ko xurîniya xwe kirin, nêçîrvan bi rê ketin. Êh... nêçîrvan jî

bera nêçîrvan bûn; bi tîfîngên desta herî baş, bi dûrebîn... Xulam tajî berdand û em ketin rê. Ez jî dûredûr li pey wan im. Te dî eyb e ko meriv şerefa mezin û maqûlan û nexasim a mêvanên wisa bişkêne. Wele ji serê siba Xwedê heta piştî esira dereng Elî axa û mêvan û qewta nêçîrvanan; ha ew newal li min ha ew gaz li te, ha ev mit li min ha ev mesîl li te bi gera li pey nêçîrê efter bûn, betilîn. Betilîne jî li wê derê bihêle, li ber xwe jî dikevin. Ewçend nêçîrvanên bi navûdeng ko bê nêçîr bizivirin ser kevaniyan, de dûrî ji Axê rûreşî ye, rûreşiya giran e. Êh... çî bikin? Rebena sihêtiya xwe kirin. Wele tam qewlê xwe dan ko bizivirin gund bi siwarî kişiyam pêş û çûm li ber Elî axa sekinim, min patekî dayê û got: “Ez xulam we dora xwe kir, vêca dora min e. Bi Rebê izetê kim herçî bê nêçîr em îşev nezivirîn bi ser kevaniyan de. “ Elî axa gote min: ‘Kuro lawo te ne tîfîng e, ne çek û sîlahêkî ye, tu yê bi çî nêçîrê bikî?’” Min gotê: “Ez xulamê haziran im, Mihemed Eliyê delûdîn im. Ev karê min e, îşê we pê neketiye.” Wele min berê serê hespê xwe li ba xist û da xarê. Di destê min de şivekî heye ko serî digihîje erdê. Wele min şiva xwe rakir û geh li rastê geh li çepê, geh li vê tûmikê geh li wê kemê dixim, bi her dawêşandina şiva min re ya cotekî kew hema dibêjin pirr bi hewa dikevin û dikevin erdê ya jî kêroşkekî hildipetike û li ser piştê dikeve. Ko tajî pejn hilanîn dane dû min û nêçîrvan jî dan pey tajiyan. Wele di nava bîskeke de êdî xurcên serpiştê hespên siwaran ji nêçîra min a ji kew û kêroşk û rawiran nehat hilanîn. Êdî min got: “Axa! ji min ew qas, êdî îro ew çend bes e.” Wele em zivirîn gund, zariyan ew şev kêfa gurê pîr kirin.”

Çima ya jî çawa bû nizanîm, Mele Hadî hat ber dikanê selav li me kir, me pirsar hevûdu kir. Di pey de ji me re got:

— Çî ye we guhê xwe daye vî Qelşo î kêra vira, ji we re çî virê dike?

Min ji Mele Hadî hez dikir, lê bi rastî ez ji vê gotina wî aciz bûm û min gotê:

— Haşa ew çî behs e? Em ji xwe re suhbet dîkin.

Mele Hadî zivirî çû dikana xwe. Hecî Mihemed Elî di ber xwe de got: “Ji periya welî, ji weliya xwelî. Heyf e ko ji yekî mîna Seydayê Mele Huseyn bê îqadekî wekî viya ma.”

Wekî ko masî bi serê nîka masîvanî girtibe, herwisa firseta gotinê ket destê Mele Mehmûd, li me çav kir û jê re got:

— Bi Xwedê kî apê Hecî Mihemed Elî, te dî te û rehmetiyê Seydayê Mele Huseyn we bi hev re hevaltî kiriye. Heta dibêjin ko hûn bi hev re li şerê Qorayê dîtine.

Serî di ber de, Hecî Mihemed Elî li Mele Mehmûd vegerand:

— Ji xwe wayê pê dizanî, êdî ez çî bêjim. Wayê bisilman pê dizanin, Mele!

— Çi şik? Xwedê jê razî. Lê ev efendiyên ha - Mele Mehmûd ez, Ethem û Fikrî xoce nîşanî wî da - pê nizanin. Ko tu li ba wan jî bêjî, hêvî Xwedê belbî îmana wan jî xurt bibe, îqada wan bikeve cî. Tê jî pê xwedanxêr bibî. Xwedê-jê-razî dilê Mele Mehmûd nehişt serpehatiya xwe ji me re got:

— Şer bû, şerê bisilmanan û qoce kafirî bû. Zivistan e, sar e, serma ye, gêdûk e: Eskerên bisilman hînî sermaya wisa şedîd nebûne; qalind li xwe dîkin nikarin bilibitin, tenik li xwe dîkin dikarin bilibitin, lê vêca ji sermayê diqefilin. Eskerê wî kafirî tenik li xwe dike, lê di ber de jî araqê vedixwe pê germ dibe. Êh... ewê eskerê me çawa bi wî kafirî re şer bike? Fîzar-fîzara wan e, meazelah! Wele ez bûm, himet bereket hazir be Seydayê Mele Huseyn û Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî bûn, Şêx Evdilqadirê Gêlanî, Şahê Nexşebend, Hezretî Elî, Hemze Pêlewan û li ber cemala navê wî selewat Hezretî Mihemed, wele hema me da pêşiya zariyan, şûr kişand û êrîş bir ser wî kafirî. Her carê ko em li milê rastê şûrê xwe dadiweşînîn bi êlama Xwedê şûrên me çil carî dirêj dibin û pê re çil serî wek kulî dikevin erdê, vêca em li çepê dadiweşînin dîsa şûrên me çil carî li xwe dirêj dibin û pê re çil serî dikevin.

Yekî jê re got:

— Ev yekcar çi bû? Çawa bû. Qey destê wan bi doxîna diya wan ve bû ko li ber we dest ranedikirin?

Mele Sacid nihiçik di teniştê de lê da û got:

— Hecî efendî û kesên dinê xeybane bûn qey ji kafiran ve dihatin xuyankirin Xwedê-jê-razî.

Hecî serê xwe hejand:

— Lê...lê... Lê çawa. Ji xwe eskerê kafir ji eskerê me re digot: “Wele hûn ne tişteke in, lêbelê ji nav we carina refek kevok radibin û bi ser me de tîn, ew in ko qira me tînin.

Mele Sacid jê pirsî:

— Êh baş e, Hecî efendî, ev qet çek û sîleh, top û tîfingên wî kafirî tunebûn? Ev qet derba wan li we nediketin?

Hecî bi destê rastê riyê xwe yê şînboz î pîroz mizda û bişirî.

— Çawa tunebûn? Wele wek taviya teyrokê berikê top û mîtralyozê wî kafirî dihatin me. Dihatin me lê çawa? Li me diketin, di cilê me de derbas dibûn diketin hundir, di navbera tazî û kirasê me de diman.

Yekî jê pirsî:

— Hûn pê birîndar nedibûn?

Wisa xuya bû ko dilê wî zatê muhterem bi nezaniya me dişewitî. Serê xwe bi bişirîneke nerm ve hejand û got:

— Himm?... Birîndar bûyin? Ciyê berikên top û mîtralyozên wî kafirî di canê me de dibûn wek pelqik. Piştî rojekê du rojan ji berê xwe ve winda dibûn. Lê yê dijwar ne top û mîtralyozên wî kafirî bû, serma û seqem bû. A di wî şerî de rehmetiyê Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî serma girt, piştî ji şer vedigere gazî jina xwe dike. Dibêje: “Keçê ka were çend hecama bavêje navmilê min.” Jina wî ya xafil dibêjê: “- Êra li te xêr e, hecamê çi lo? Tu ji malê derneketî, ji ber tifikê neçûyî ber sefikê jî, te di ko de serma

girt? Tu ji pesna xeber didî?” Mele Yehya lê îsrar dike. Jinik tê ko hecama lêxe. Çawa destê xwe davêje ko kirasê wî derxe, bi carekê xuşîn bi berikên di navbera kiras û canê wî de dikevin û dirijin erdê. Jinik ko çav bi van berik û çav bi wan pelqikên li ser canê mêrê xwe dikeve, hew xwe radigire, hema ji nav serê xwe dike qîrîn û dibêjê “ ber cemala Mihemed pêxember selewat! Keça min lawo were li hikm û kerametên bavê xwe binihêre.” Ji ber vê xafiliya jina xwe ko kerametên wî lê aşkere bûn Seydayê Mele Yehya negihîşte serê sibê, çû rehmata Xwedê.”

Ethem jê pirsî:

— Çima qey jina wî nizanibû ko mêrê wê çûye şerê Qorayê?

Hecî Mihemed Elî lê nihêrî û got:

— Xwedê xêr pê kiro, qey karê qenc û weliyan karê zarûka ye? Tu dinihêrî li vê derê bi canûcesedê xwe li ba te ye, lê ew bi kerametê xwe li koşekî dinyayê li derekî dinê ye; ya gemîkî xerq dibe, wê xelas dike, ya tofan rabiye çiyê destê xwe dide berê, ya agir bi derekê ketiyê li hawarê çûye. Ji qenc û weliyan re ka sekn û sekan heye?

Mele Mehmûd bi wî awayê xwe yê taybetî ya nerm û bawerkir jê pirsî.

— Apê Hecî, gelo ev welî û qencê Xwedê ko hene ma ew jî di ser hev re û di bin hev re dest bi dest in, sinif bi sinif in? Te dî gere meriv ji hikmetê Xwedê xafil nebe. Lê meriv bala xwe didê gava kerametê hinan wek yê Mele Yehya azlû dibin, ew tafilê pê dimirin û yên hin weliyên Xwedê yên wek zatê te -ku tu şik tê tune- azlû dibin, tişteki bi wan nayê. Ev çawa dibe gelo?

— Lê çawa? Xwedê jê razî! Ehlê keramet gişt ne nola hev in. Hin jê hene; ne ew bi xwe zanin û ne ehlî bi wan dizane, lê îla her Xwedê bi wan dizane. Hin hene; ew bi xwe, bi xwe nizanin, lêbelê ehlê dora wan bi wan dizanin û Xwedê bi wan dizane. Desta sisiya; ew bi xwe bi xwe dizanin, Xwedê bi wan dizane, lê xelk bi wan nizanin. Gava kerametên van hersê sinifan

aşkera dibin, tafilê pê dimirin. Vêca destek dîtir heye ko hem ew bi xwe dizanin, hem xelk bi wan dizane û ji xwe Xwedê jî bi wan her dizane. Gava kerametên ehlê vê desta paşiyê aşkere dibin tiştêk bi wan nayê, ji xwe herkes pê dizane.

Mele Mehmûd:

— Dibêm ewê van ên paşî ji merteba herî bilintir bin, ne wisa gelo?

Hecî Mihemed Elî:

— Lê çawa? Xwedê jê razî! Ma şik tê heye?

Mele Mehmûd:

— Ez dibêm tu jî ji van ê han î, ne wisa?

Hecî bi dilxweşî di maneya “erê wisa ye” de bişirî û got:

— Alimê xeybê her îlelah e.

Mele Mehmûd:

— Maşelah û elhemdûlillah! Lê ez li vê ecêbê şaş dimînim, apê Hecî. Zatên mîna te ko wisa ehlê keramet û marîfet in; gelo hikûmat çima ji bona selihandina karûbarê xwe û yê xelkê wezîfê nade we? Ya gelo pê nizane, çi behs e?

— Çawa? Dibe ko hikûmat pê nizanibe, Xwedê jê razî! Heryek ji wan bi wezîfekê wezîfedar e.

— Meqseda min ev bû ko gelo hikûmata me ka wezîfekê, ez çi bêjim mîna xefiyetî an casûsî da te neda te?

— Lê çawa...

— Ev efendî jî ne xerîb in, hevalên me ne. Tu ji kerema xwe re ji me re behsa wezîfa xwe bikî bira ew jî pê bizanin.

— Mele Mehmûdê min î delal, çend sal berê li Bismilê qeymeqam kî qetrehm î zalim hebû. Hikûmatê ew kiriye qeymeqam û şandiye Bismilê, lê hikûmata reben ji ko derê bizanibe ko di dilê wî de kudikên berazan hene. Merivê şîrê xav vexwarî, ew jî dibêje ‘êdî ez bûme qeymeqam, ka

di ser min re kî heye... Kî dikare çi ji min bike...’ Li xelkê bi kêfa dilê xwe tehde û neheqiyê dike. Ji jor de ji min re xeber hat, gotin “çika here binêre ev çi bela wî ye. Xelk çima jê gazin dikin?” Min hespê xwe derxist, teng û bertenga wî lê şidand, xurcika xwe avêt serpiştê û berê xwe da ber bi Bismilê ve. Ez ketim nav çarşiya Bismilê hê piştî nîvro ye, êdî mamûr ji firavînê dizivirin. Carekê min bala xwe dayê ko Qeymeqamê min û te li ber yekî gundiyê ko wî avêtiye erdê; bi dara lê dixê û jê re dibêje “êşekoxlî êşek! Kerê te çima li nav rê rêx kiriye?”. Di nav destûpiyê vî zalimê Qeymeqam de, zarebara vî merivê gundî ye ko rebeno bi tirkî jî nizane da cewaba xwe bide. Bismilî jî ji tirsê vî zalimî; yên ko ketine dikanên xwe, xwe melisandine, yên ko ketine ber rîknên serê koşan û xwe veşartine. Wele ez çûm ber Qeymeqam, çik ji hespê peya bûm û bi qamçiyê xwe bi Qeymeqam ketim; ‘ goliko soro te çi xwariye! ‘ Gote min “Ûlan tu zanî ez kî me? Ez qeymeqam im.” Wele min guh nedayê, min ew li erdê di rêxa kerê de gevizand. Mêrikê gundî rabû li riya xwe çû û ez jî çûm hikûmat qûnaxiyê dayira qeymeqam. Bekçiyê ber deriyê oda qeymeqam gote: “Tu kî yî, çi dixwazî? Qeymeqam efendî hê nehatiye.” Min tehnekê lêxist û ketim hundir û çûm li ser masê rûniştim. Qasek tê bihurî Qeymeqamê min û te sergirêdayî hat ket hundir û çav bi min ket, got: “Ûlan tê hem di nav çarşiya Bismilê de li min xî , irzê min bişkênî û hem jî werî di oda min de li ser masa min rûnêy? Binêre ezê çi bînim serê te.” Min bi hêrs got “parlo! “(*) Tafilê xwe da hev. Min gotê” Ji vê deqîqeyê pê de min tu ji qeymeqamiyê avêtî. Ji niha û pê de tu ne qeymeqam î û ne tiştêk î. Siktir be ji ber çavê min here.” Xwe avêt ser destûpiyê min, giriya got: “Eman di bextê te û Xwedê de me, ez piçûk im min cahilî kir, tu mezin î efû bike. Tu min bidî xatirê zarûk û zêçê min.” Min got:”Kerê kurê wî kerî! Gava te li feqîr û hêsîran tehde dikir xweş bû? Zarûk û zêçên te çima wê gavê nedihatî bîra te? Haydê yelah baqalim...”

Wele çendê wî alî li Diyarbekirê bûm, ji min re hin mîx û hacet lazim bûn. Min got ka serîkî li çarşıya îspahiyê jî xim. Min bala xwe dida xerûper tiştûtebayên li ser ereboka, min dit yek gazî min dike: “Mihemed Elî efendî! Mihemed Elî efendî!” Ez lê zivirîm, min ew nenasî. Min gotê: “Xêr be min tu nenasî, tu kî yî?” Stûyê xwe li alîkî xwar kir û gote min: “Malava çawa te ez nenasîm? Ma nayê bîra te? Di filan salê de ez qeymeqamê Bismilê bûm, te ez jê avêtim. Ji bona rizqê zarû û zêçê xwe niha li ber vî desgehî me û bi van hesin û bizmarê zengarî nifqê wan derdixim.” Ez bişirîm û min gotê: “De bixor kero çawan e... Xwedê dabû te, te nizanibû bixwara. Ma tu nizanî ko pêstûrî ji gayê cot re jî namîne?” Got: “Erê weleh Mihemed Elî efendî ez poşman bûm, lê êdî ji destê min filitî.”

Mele Mehmûd destên xwe di hev de miz dan û bi şîranî gotê:

— Maşelah! Subhan ji wî Xaliqî re! Xwezila çend kesên dîtir jî wekî te hebûna. Lê wayê çawa bûye ko te ji bîra nekiriye? Bi Xwedê kî apê Hecî bi casûsî masûsî qet neçûyî nav dewletên ecnebî?”

— Lê çawa. Hê zemanê rehmetiyê Menderes bû. Rojek Elahûalem çî roj bû nizamim, hatim malê xatiya we got: “Polêsek hat malê li te pirsî. Got ko Mihemed Elî efendî çî gav were malê bira esehî nesekine bê Qeymeqam efendî bibîne.” Hela! hela! Xwedê xêr ke. Hema ji ber derî zivirîm, çûm qûnaxê, derketim hizûra Qeymeqam, min gotê: “Xêr e? Te ez xwestime?” Qeymeqam efendî rabû piya temena kir, got: “Haşa! Mihemed Elî efendî çî hedê min e. Wele Walî efendî têlêfon kir û got: Ecele Mihemed Elî efendî bibînin û bêjinê bira were vê. Êdî çî ye çî nîne pê nizamim.” Êh ji xwe karûbarê riya min kiribûn. Siwar bûm çûm Diyarbekirê. Derketim hizûra Walî efendî, min pate lêxist û got: Kerem ke Walî efendî te xêr ê. Walî efendî rabû temena kir û got: “Mihemed Elî efendî ez nizamim çî ye, çî behs e, lê başwekîl (serekwezîr) Ednan Menderes têlêfon kir û got ecele li erd be li esman be gere hun Mihemed

Elî efendî bibînin û wî bişînin vê derê. Hertîşt hazir e, hema em li hêviya te ne.”

“Min da hişê xwe ko karekî muhîm nîn be Menderes gazî min nake. Serê we neêşînim, ez çûm Enqerê, derketim qûnaxa Menderes, nobedar li ber derî bûn, gotin “dûr!”(**) Ez li wan fetilîm û min got: “parlo!”(*) Wele pate lêxistin. Min derî vekir û ketim hundir ko wayê Menderes li odê wek feqiyê ko dersa xwe mutale bike, berûberê odê diçe û tê. Min patekî jê re lêxist. Ko çav bi min ket, kêfa wî hat, beşera wî xweş bû û got: “Wey Mihemed Elî efendî bi xêr û bi ser çavan re hatî. Misêwa min rêpaniya te dikir.

“— Êh xêr be Başwekîl efendî, te ez heta vê derê anîm. Hêcrana vê çi ye. Ne bê sebeb e.” Rehmêtî kûr kûr fikirî û li min vegeirî, got: “ Na wele Mihemed Elî efendî ne bê sebeb e. Ji Îngîlistanê pîlanek ji me re lazim e, û ferz î ferz lazim e. Casûsên me yê ko çûn bînin, ya asê bûn nema derkevin ya hatin girtin. Vêca em fikirîn, me got hebe tunebe yê ko bikare me ji vê tengasiyê derxîne bi tenê ewê Mihemed Elî efendî be. ^a wele niha em li te tifiqîne.”

“Çi bikim? Biye cil û ketiye mil. Wele rabûm çûm Îngîlistanê, pîlan û tiştinên ko lazim bûn min berhev kirin. Li kuçekî Îngîlistanê digeriyam, bala min pêket ko du meriv li dû min in nêzenêz taqîbata min dikin. Ez sekinîm. Min guh dayê ko yek ji yê dinê re dibêje”van vîng vonk.” Yanî tu zanî, ev casûsê tirka ye. Wele min jî necamêrî nekir, li wan zivirîm, min jî got “fîn fan fonk fînk fank?” yanî qey ez nizanim hun jî casûsên îngîlîz in?” Ew ji pey min vebûn.

“— Ez zivirîm hatim Tirkiyayê, Enqerê. Çûm qûnaxa Menderes, di derencan de hilkişîm hatim ber derî. Nobedar gotin “dûr ûlan!” Min got ûlan bavê we ye, êşekoxlîêşek! Parlo! Wele tafilê xwe dan hevûdu û pate lêxistin. Ez ketim hundir ko Menderes li ser masa xwe rûniştiye û mitale

dike. Çawa çav bi min ket, çirçên eniya wî ketin hev û got: “Mihemed Elî efendî malava ka tu hê li van dera yî, hê neçûyî?” Min gotê: “Başwekîlê min ez çûm û hatim.” Wele min rakir ji bin çengê rastê lûlikeke kaxiz, ji bin çengê çepê yeka di, ji milê rastê yek, ji ber milê çepê yeka dîtir, ji ber gora rastê lûlikek, ji ber gora çepê yeka di, ji navrana şal yekê, ji berîkên saqo û şalwar yek bi yek lûlikên kaxiz derxistin, li ser masê li ber Menderes kire lod. Menderes li loda ber xwe û li min nihêrî, lêva xwe hilkir û gote min: “Malava ev çi hal e? Hema te gişt bikira destik û bikira derekê.” Min gotê: “Ev karê casûsiyê ye, ne yê başwekîltiyê ye. Ne karê zarûka ye, efendî! Bi rê de oxilme moxilme dibin, te dît ko lûlikek qefaltin, qe nebe yê dinê xelas dibin.” Menderes serê xwe rast û çep hejand û got: “Welahînê Xwedê sed sal bimana min vê fehmê nedikir. Helal be ko tu bera Mihemed Elî efendî yî.” Min gotê: “Baş e, emrê hikûmatê û xizmeta dewletê li ser ser û li ser çavê min. Lê qey timî ewê karê bi vî awayî di stuyê min de bimînin. Ev qeliyan? Ji casûsê dewleta Alî Osman kes nema? Lê sibêroj ko bimirim ewê çawa be?” Rehmetî got: “Qet behs meke. Îro çend roj in ez jî lê difikirim.”

— Qey ne wisa ye? Ka kî vê famê dike?” bi awayê pesindanê Mele Mehmûd got û jê pirsî:

— Gelo qet bi casûsî an wekî dinê, riya te bi nav Êris neket?”

— Lê çawa... Xwedê jê razî!

— Halê wan çawa bû gelo, miamela wan bi çi awayî bû, tu bi çi karî çûbûy?

— Halê wan? De ka ewê halê wan çawa be? Genim tune, ceh kê m e. Hêsîr dar dihêrin, arê daran li nav arvan dixin, dikan peksîmat û dixwin. Ne ji vî awayî be halê wan baş e. Kafir te dî ji hevûdu re bi aqûbet in. Herwisa ji dînê xwe re jî pir şedîd in. Ez hêsîr bûm di destê wan de. Di herbê de em dîl ketibûn. Wan ez birim bajarekî, qulikek xanî dan min. Karê min ew bû

ko rojê carekê herim qereqolê xwe nîşanî wan dim. Rojekî qomsêr gazî min kir, bi awirekî tûj li min nihêrî û gote min: "Tirko! Çavê xwe baş veke, baş guh bide min. Tu tirk î, bisilman î. Tu yê mîna tirkan li xwe ki û tevbigêrî û wekî bisilmanan limêj û taeta xwe bikî. Em qebûl nakin ko tu wek erfûedetê me ûrisan bikî, herî dêrê an dev ji dînê xwe berdî werî ser dînê me. Tu li ser dînê xwe û em li ser dînê xwe."

— Gelo çima nedixwestin ko haşa tu herî ser dînê wan û wek erfûedetê wan bikî?

— Bi fikra wan, hetanî meriv li ser dîn û erfûedetê xwe be, meriv ji wan bi ferqtir e. Meriv bisilman e, li ser dînê xwe ye û ew jî fileh in li ser dînê xwe ne. Meriv û ew tevîhev nabin. Ka pez û gur dikarin tevîhev bibin? Lê gava tu herî ser dînê wan, -ê hestiyê helal heram, yê heram jî helal nabe-, çawa be jî ewê damar bikişîne, tê tiştên wan hîn bibî û bi casûsî neqlî Tirkiyayê bikî. Ew jî vê qebûl nakin.

— Subhanelah çi kafirekî jîr e kur-ro? Tam bi îşê xwe zane. Lê em vê li alîkî bihêlin. Karê dinyayê te dît li dinyayê dimîne. Ji xwe Xwedê xêra te jê hasil dike, înşe-ellah. Lê wekî dinê hin tişt hene ko ne bi destê hikûmat û ehlî ne. Îla bi destê Xwedê, bi îcaza Xwedê jî bi destê we qenc û weliyên Xwedê diselihin. Herwekî em bêjin wek tofanê, agir û şewatê, lehiyê. Te dî Xwedê haşa bi zat û sifetê xwe nayê yan jî em bêjin ko agir bi derekê ketiye û taxek, gundek an bajarek daye ber xwe, ê Xwedê ezze-we-celle bi xwe nayê destê xwe nade berê. Emir dide qencekî xwe, welîkî xwe, ew weliyê Xwedê bi îzna Xwedê destê xwe dide ber wê qisûmatê û ew disekine. Gelo qet tiştêkî wisa bi serê te de hat an ne.

Ev pirsê li ser mesela binê kundir bû ko Mele Mehmûd jê dipirsî.

— Mele Mehmûdê min, tiştên ji bona Xwedê di riya Xwedê de ne. Çend sal berê baraneke gurr bariya. Du-sê hefte bi şevûroj, bê çav vekirin, mîna devê meşkê misêwa ev bimbarek dibariya. Li kuça çokek lehî rabûbû,

Îbadulah nikaribûn ji malê xwe derkevin derva. Êh ji destê evdên xafil jî tiştêkî nayê, ewê evdê reben çi bikin, çi di destê wan de heye?

“Şevêkê piştî limêja eşayê dereng, xatiya we ket nav ciya û raza. Yê min jî hin mijûlahiyên min hebûn, ez pê bilî bûm. Min ew qedandin, êdî karûbarê nav ciya kir, min nihêrt deriyê me yê derva lêket. Hela! hela!... Vî wextê ha ewê kî be. Şev yek û xerab gelek! Te dî divê meriv hesabê xwe bike. Qotek tifyinga min hebû, min ew ji pîncê dîwêr anî û ez çûm pişt derî, min lê deng kir: “kuro tu kî yî?” Dengêkî hate min, got “ez im, derî veke.” Hela! hela... ev kî ye. Te dît qenc hene... xerab hene... meriv nizane. Min dengê xwe piçek bilintir kir: “Kuro lawo tu kî yî?” Dîsa got: “Ez im û ez im, derî veke!” Êh şire-şira baranê ya Îlahî wisa gurr e ku; meriv dengê nas jî ji hev dernaxe. Ez aciz bûm, wele min sirma tifyingê qelabt û fişek da berê -te dî meriv nizane qenc hene xerab hene, vê şeva Xwedê vê saeta ha... çi zanim- û min gotê:” Kuro lawo ez ji te re dibêjim, tu kî yî? Çi kes î?” Deng vêca bilintir bû û got: “Mihemed Eliyê min lawo tu kor bûyî? Ez im, xerifiyo ez im!” Min derî lê vekir ko himet û bereket her timî hazir be. Xwedê celle-we-celallahû bi zat û sifetê xwe li ber derî ye. Ez kolî dest û piyên wî bûm. Min xwe da alîkî derî, rê dayê ko were hundir û pê re jî min gotê:” Ya Rebî vê şeva ha li te xêr e? Kerem ke were hundir.” Gote min: “Mihemed Eliyê min lawo! çi hundir e, çi hal e? Tu nabînî ko îro serê çend şev û çend rojan e ko esman qelişiyê û tê de baran nasekine. Ev kar karê te ye, divê tu herî esman pîne bikî.” Min gotê: “Ya Rebî! Ez rebenê Xwedê û ev karê ha!” Gote min: “Na lawo! Îmkana wî tune ye divê tu bikî.” Min got: “ De ka ez herim şalê xwe li xwe kim, ez tazî me.” Gote min: “Lawo şalê te li te ye.” Min bala xwe dayê subhanallah bera jî şalê min li min e. Lê ez baş pê dizanim ko ez bi tena derpê û kiras hatibûm. Min gotê : “Baş e, herim çakûç û bizmarê xwe bînim.” Gote min:” lawo! Tu çi merivekî bêsebir û xafil î. Li berîkên şalê xwe binihêre.” Min berîkên xwe oxilme

kirin, di ya rastê de çakûçê min û di ya çepê de jî mîxên zêrîn.” Min got: “Ez hazir im. Ka ezê çawa herim?” Got:”Tu çi evdekî min î bêsebir î.” Min ha bala xwe dayê ko erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû weleh hetanî ko esman hat ber fesala destê min. Min bala xwe dayê ko di nivî de çi qelşekî lêketiye. Min destek avêt keviya qelşê ya rastê, yek jî avêt ya çepê û got: “Ya bi qewet û himeta Xwedê û Resûlê ekrem! Ya Şêx Evdîlqadirê Gêlanî û Şahê Nexşebend!” bi hemî hêz û taqeta xwe min herdû kevî kişandin ser hev, bizmarê xwe danî ser, bi çakûçê xwe kuta. Piştî ko min ew baş bizmar û asê kir, karê min qediya. Êdî ji berê xwe ve bi hikmeta Rebê jorîn erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, ha min dît ko ez li ber deriyê malê me. Ketim hundir, min derî çengel kir. Çûm odê, xwe şêlihand, lembê zenûn kir û ketim nav ciyan. Xatiya we ji xewê veciniqî û got:”Wîşşş! Meriv dibê qey tu ji nav teyrokê têy, ev çi halê te ye?” Min gotê: “Herê korê tu bizerê razê! Tê ji ko derê zanibî ko ez ji ko derê têm?” “Hecî Mihemed Eliyê Qelşo”, “Mihemed Eliyê Qelşo” weyaxud tikûtenê “Qelşo”: Min navûdengê vî camêrî zû de, hê ji zemanê zarûtiya xwe bihîstibû. Lê ji min re mîna yekî efsanewî dihat: Wekî mala zalê, Betal Xazî, Herkul an hin kesên dinê. Min nizanibû ko Mihemed Eliyê Qelşo an Hecî Mihemed Eliyê Qelşo hê jî dijî û yek ji endamê civaka me ya wê rojê ye. Loma gava ko ew bi min dan nasîn wekî ko di xewnekê de bim, wisa şaş mam. Wisa şaş mam ku; heta bi bersîva cara pêşiyê îqna nebûm, du car sê car min ji Fikrî Xoce û Mele Mehmûd pirsî da ev camêr ew Qelşo ye.

Zilamekî bi bejna xwe ne kurt û ne jî dirêj bû. Di seriya şêst salî de bû. Bi canê xwe genimgûniyê girtî bû. Riyekî şînboz î fereh lê hebû. Destên wî fereh û gir bûn; xuya bû destên kar û xebatê ne. Şewqeke ji wanê Dawid

Nêrgiz malê Diyarbekirê li serî, saqokî lacîwerdê bi ser xêzên spî yê qaçax û şalwarekî reş lêbû. Karê wî hostatî bû: Hostayê xanî lêkirinê, yê aş danîn û niqarkirinê, yê haletê cot û xeratiyê bû. Hostayên bi vî awayî li gundê xwe timî kar nabînin; seyar in, li ko derê kar hebe çendekî ji mala xwe bi dûr dikevin, li ciyê kar-lê-heyî dixebitin, di pey xelasiya karê xwe de dizivirin mala xwe.

Xêrnexwaz û çavnebar gelek in. Bebextî bi hecîtiya wî de jî anîbûn. Dibêjin ko du sê roj berî hecîkî ji gundê wî ji Hecê bizivire mala xwe, Hecî Mihemed Elî tesadufen li Diyarbekirê, li otêla Çelîk Palasê ye. Qeflekî hecî berî yê gundiyê wî ko hatine, ew jî li wê otêlê ne. Hecî Mihemed Elî pirsawan dike, li halê rêwîtiya wan û yê tengasî û zehmetiyên wan ên li Hecê dike. Di pey de pirsaw gundiyê xwe yê ko çiyê Hecê dike. Ew jî dibêjin: “Wele elhemdûlîlah ji aliyê sihetê ve baş e, li heyatê ye. Lê tiştê ko heye li ser Girê Erefayê cizdanê wî yê pera jê dizîn. Rebenê Xwedê yê bêçare kir qareqar û hawar. Êdî misilmanên dorhêlê xêra xwe jê re destmal vekirin pere berhev kirin.” Ew jî dotira rojê ji Diyarbekirê berê xwe dide malê, tê gundê xwe. Yê selavê lê dikin an pirsaw wî dikin, bi wan de dixeyide, dibêje: “Heyla fasiq û zindîqno! Ez ji mala Xwedê, ji Heca şerîf tîm û wek hecîkî hûn nayên seredana min.” Gundî êdî naçar bawer dikin, diçin seredanê. Ew jî teberikên mîna tizbî, xelek û hwd ko ji Diyarbekirê kiriye û bi xwe re aniye li wan belav dike. Du-sê roj şûn de, heciyê gundiyê wî tê. Gundî diçin seredana wî jî û dibêjin: “Wele elhemdûlîlah wayê tu jî û Hecî Mihemed Elî jî hûn bi saxî û bi selametî vegeerîn, ji gundê me îsal du hecî derketin.” Heciyê dinê dipirse: “Hecî Mihemed Elî kî ye, hûn behsa kîjan Mihemed Elî yî dikin?” Jê re dibêjin: “Hecî Mihemed Elî lo! Yanî Mihemed Eliyê Qelşo.” Mêrik hêrs dibe, xwe hiltîne li erdê dixê. Dibêje: “Hişk û ji binî derew e. Qelşo nehatiye Hecê.” Ev gotina wî tê bi guhê Hecî Mihemed Elî dikeve. Êvarê tam wextê ko gundî li mala heciyê dinê ne,

Hecî Mihemed Elî radibe diçe seredana wî. Piştî kêfxweşî dana hev, Hecî Mihemed Elî di nav civatê de dibêjê: “ Heciyê delal! Hec ew e ko meriv diçe mala Xwedê li gunehê xwe poşman dibe, li ber destê Xwedê û pêxember tobe dike ko êdî derewan neke, bêbextiyê neke, heqê xelkê nexwe, neûzû bîllah tiştê heram neke û heqê camêran jî înkâr neke. Newisa Hecî?” Heciyê dinê dibêje:”Belê, sedeq amentûbilah! wisan e.” Hecî Mihemed Elî dibêje:”Ku wisa be, herê agir bi malê keto tu çima xwe ji Xwedê dikî û dibêjî ‘Mihemed Elî derewan dike, nehatiye Hecê?” Heciyê dinê dibêje; “Ez qet jî xwe ji Xwedê nakim, tu nehatî Hecê û li wan deran jî çavê min bi te neketiye.” Hecî Mihemed Elî li wî û gundiyên li civatê dizivire, dibêje:

— Li ser Girê Erefê, serê sibê berî ko birêkevin herin şeytan biricimînin, te ji nava serê xwe nekir qîrîn û negot “hawar e! gidvano hawar e perê min dizîn!” Gundî vediciniqin û Heciyê dinê jî li hevûdu soromoro dibe û dibêjê:

— Tu ji ko ve zanî?

Gundî şaş dibin li wan dinêrin. Lewra Heciyê dinê ji wan re behsa her tiştî kiriye, lê behsa vî tiştî qet nekiriye ko em bêjin Mihemed Elî ji wan bihîstibe.

Hecî Mihemed Elî:

— Êh Hecîko! Em herçî hecacên Silîva, Bismil, Hezro û Batmanê me xêra xwe destmal venekir -Xwedao tu ji xêrê dernexî!- û ji te re pere berhev nekir?

Heciyê me yê dinê bêtir şaş dibe û bi awakî şeqizî û berxweketî dipirse:

— Êra tu ji ko zanî û êra bi xatirê Xwedê tu ji ko pê dizanî?

Hecî Mihemed Elî bi ser gundiyê xwe yê bextreş de diçe:

— Ez hê jî bêjim?

Bersîv ji Hecî û deng jî ji gundiyan dernakeve. Rastî û heqiya çûna Hecî Mihemed Elî ya Hecê ji aliyê ometa Mihemed ve tê pejirandin.

Demek kurt di pey hevdiatina me ya wê rojê de ji Silîva çûm. Di dawiya tîrmeha 1967 an de zivirim. Mele Mehmûd êdî li ber dikanê nîn bû. Niha di karekî dîtir de bû. Me hevûdu dît, pirsra hevûdu kir û li hal û ehwalê dinyayê pirsî. Mele Mehmûd ji min re got:

— Lê! Malaminê! Hecî Mihemed Elî wefat kir.

— Kîjan Hecî Mihemed Elî, gidî?

— Hecî Mihemed Eliyê Qelşo.

— Na lo! Çawa? Bi çi awayî?

Mele Mehmûd:

— Di wan rojên nebixêr yê şerê Îsraîl û ereban de bû. Ez li ber Tekelê rastî wî hatim, min pirsra wî kir. Nexweş bû, bêkêf bû. Dinaliya. Min jê re got “Bi Xwedê kî apê Hecî ev cihuyê Îsraîl tovê Îslamê brand, erebên ometa Mihemed qelandin. Gelo hûn qenc û welî çima li hawara birayên me yê ereb naçin?” Gote min:” Em çawa naçin? Wele em diçin lê ji destê me hew tê. Şevtira dinê ez bûm, Hezretî Mihemed bû, Hezretî Elî şêrê Xwedê bû, Şêx Evdilqadirê Gêlanî bû, Şahê Nexşebend bû; em çûn ko herin li hawara ometê. Me gava ji dûrî ve bala xwe didayê; bisilman û kafir ji hevûdu kifş bûn, erê evên ha bisilman û yê dinê cihû ne. Lê gava me êrîş dikir û em diçûn bi ser de hema gişt mîna hev xuyan dikirin. Me serî dibirî, ji dil xwe ve ko neyarê ometa Mihemed in, cihû ne; piştî ko em ji şer fereh dikişin û dinihêrt malikê tu xera bî ko kuştiyên ji destê me gişt ereb in. Êdî kafir û bisilman tevlihev bûne, di navberê de ferqek nemaye. Me kir û nekir heta fecra sibê me tişteki havil nekir û em vegeîn. A tu dibînî ji wê şevê de ye min serma girtiye, wê sermaya pîs a çola Erebestanê ye û bi Xwedê ez dizanim ko filitandina min jî jê tune.” Min

gotê “Na û devê xwe li xêrê veke, apê Hecî!” Gote min “Na! na! Birîndar bi birîna xwe dizane.”

“Di pey de çendekî derbas bû, rojekê meleyê camiya Tekelê selatan da û di pey de wefata wî ragihand. Ez çûm hawariyê. Min li hal û hewalê mirina wî pirsî. Ew roja ko ewê tê de bimire, dibejê gazî mele bikin. Gazî melê taxê dikin. Rehmetî dibêjê: Dest pê ke bi ser min de Yasînê bixwîne.” Mele du dewr Yasîn pê de dixwîne. Di dewra sisiya de tê heta nivî, rehmetî jê re dibêje “ mele bes e!” û pê re ber bi esman dinêre û dibêje”de were! de were emanetê xwe bistîne! De haydê were li hêviya çi yî?” û pê re jî çavê xwe li ronahiya dinyayê digire. Ev bi xwe gotina maliyên wî ne.”

Ez berdiketim. Mele Mehmûd berdiket. Lê Niyazî hosta bêtir berdiket. Ji herkesî bêtir berdiket û digot:

“— Rehmetî weliyekî xas bû. Bi welîtî û van hikmet û kerametên xwe yên ko ji me re digot ji tu weliyekî ko em dinasin kêmtir nîn bû. Lê heyf û mixabin ko ne yekî ereb bû. Heyfa wî ko umî bû, bi erebî nexwendibû an bi erebî nizanibû. Ko ereb bûna; ewê van serpêhatiyên wî bi erebî binivisandina, bikirina kitêb û ko hema kitêb bigota: ‘Qale Mihemed Elî - qedeselahû sirrehul ezîm- ‘ û van tiştê wî vegotina, we dê bidîta êdî ji xwe re. Heyf! Heyf û mixabin!”

Hecîkî hebû. Hecî Mihemed Elîkî hebû. Hecî Mihemed Eliyê Qelşo (radiyelahû teala enhû).

(*) parlo: parola, parole

(**) dûr (dur: bi tirkî): raweste, bisekine.

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: ROJEN BARNAS

Weşandin: 2005-06-28

**

Êtap

Dora aş bi şev hate ser Silo û heta wî arvanê xwe hêra, ereba xwe girêda, bar kir, roj êdî wek rimekê bilind bû. Rast e wî pê ra gîhand hinek av li serçavên xwe bike, kincên xwe dawşîne, lê toza ar ketibû nav porên wî, bin bestû û devzendkên wî û niha tabetî nedidayê, dixurand. Ji bêxewtiyê û toza ar çavên wî dişewitîn. Lema jî çawan gihîşte cewekê, ji erebê peya bû û careke dinê jî serçavên xwe şuştin. Lê dîsan jî şewata wan ma. Fikirî çawa bigihîje mal û arvanê xwe peya bike, wê avê xweke, taştêyeke sivik bixwe û bikeve nav nivînan.

Silo merivekî bi tivdîr bû. Di mala wî de her kar di dema xwe de dihat kirin, hertişt di şûna xwe de bû. Niha jî rast e nîveka payîzê bû, lê wî êdî debir— dilika xwe dabû ser hev, zimêrê zivistanê danî bû. Tenê kincên zarokan mabûn, ew jî ne xem bû. Kincên neferê malê payê pirê kevaniya wî bi xwe him dibirîn, him jî didirûtin. Divêt rojekê bi kevaniya xwe ve biçûya bajêr û çend mêtir perçê cûr bi cûr bikirîyana.

Bi rastî jî Xwedê jineke baş dabûyê. “Mala xweyê wê ava be” wî di bîra xwe de got û di bin simêlan de kenîya. Bîst mêrivan derê wî vekira xema Silê Kelo nîn bû. Ew ê li rex mêvanan rûništa û simêl badana. Wî zani bû, wekî seva rûspîtiya wî jin ê hertiştî bike.

Rê bi çel û kort bû, erebê nolî landikê ew dihejand, lema jî xewê lê zor kir û çavên wî çûne ser hev. Mejû hişyar bû, hinekî zor bida xwe wê çavên xwe vekirana, lê çav dişewitîn û wî xwest wan hinekî germ bike.

...Berê dengê girî kete guhên wî. Wî çavên xwe vekirin û dît, wekî êdî ranêzîkayî li gund kirîye. Li perê gund, li ser rê komek meriv ber hev bûne û ji gund dengê girî tê. Gava hinekî din jî nêzîk bû, dît wekî ew meriv gişk bi kincên saldata û mîlîsiya ne.

Çiqas diçû dengê girî zêde dibû. “Dibe dîsa merîv girtine?” Vê fikrê rê li fikrên mayîn birî. Lê na, wî bi xwe ew fikir da alîkî. Timê bi şev tîn merivan dibin.

Du saldata û milîsekî pêşiya ereba wî girtin û saldatekî ji wî pirsî:

— Tu kî yî û kuda diçî?

Lê Pêtrosîyanê milîse, ko karê gundê wan gişk di dest wî de bûn, Silo nas kir û ji saldat re got, wekî merivê vî gundî ye.

— Hevalê Pêtrosîyan, ev çi bûye?

— Zû here mal, wê ji te re bêjin.— Pêtrosîyan di ber xwe de got.

Silo êdî texmîn kir, wekî ev yeka bi mal û neferê wî re jî girêdaye û xwe lezand.

Di nav gund de jî saldat tijî bûn. Gişke bi çek. Hela hinekan tivingê xwe ji stuyê xwe anîbûn xwar, qey bêjî di nav şer de ne û gundekî dijmin hildane.

Du milîse jî nêzîkî mala wî rawestîya bûn. Gava Silo xwe avîte hundur, zûkî kete neferan:

— Mala te wêran be, wekî wêran bû jî, tu li ko î heta niha?— Jinê bi girî gotê.

— Çi bûye, keçê?— Silo dixwest gavekê zû serederiyê ji vê rewşê derxe.

— Dinê di serê me de wêran bûye, çi bûye.

— Îcar tu ê ji min re tiştêkî bêjî, yan ez gere hema lûbîniya te bibihêm.— Silo bînteng bû.

Kurê wî yê ko di qulça xanî de li ser qutîkê rûniştî bû, di ber xwe de got:

— Me sirgûn dikin.

— Seva çi, bona çi, yan çi gunehî dikine stuyê me?— Silo hê jî tê nedigihîşt çi bûye.

— Tu ji wan ên ber derî pirs bike, ji me re nabêjin.

— Hela ez herim ji wan sepîsiyana bipirsim, ka çi ji me dixwazin?

— Pî, neçe, ji duhu ve em dikin, nakin, tu gilîkî nadin destê me. Hela ser de vê sibê saldata seva wê pirsê kurê Avas, yê biçûk dane ber pihînan.— Jin ber zarî bû.

— Lê pašê?

— Paşê çî, kî çî dipirse tenê dibêjin “Em tişteki nizanin, ferman ji jor hatîye. Karê xwe bikin, hûn gere êvarê rêkevin.”

— Lê wekî ji duhu ve ji we re gotibûn, we çîra zarek neşande pey min?— Silo bi hêrs pirsî.

— Malxirab, me ê çawan bişandana, te nedît dora gund çawa girtine. Ka dihêlin kes ji gund derkeve. Min û Sêvdîn ewqas lava kir, me got bira gede bê cewabê bide te, wekî bêyî li malê bibî xweyî. Ez heta ser lingê wî kurmirî de xar jî bûm. Lê tişt jê derneket, hema digot na û na. Em ditirsîyan qet nehêlin tu jî têkevî gund. Evana bê Xwedê ne, bê Xwedê! Silo usan jî pê hesîya, wekî roja berê di berbanga sibê de saldat û milîsî ketine gund, li ser rêyên ji gund dertên nobedar danîne û nahêlin kes ji gund derê. Paşê wan mêrên gund gişk ber hev kirine û ji wan re gotine, wekî karê xwe bikin, wê roja din rêkevin. Usan jî gotine, tivdarekê xwe î bîst, bîst û pênc rojên seva rê bikin. Lê wê wan bi kîjan alî ve, kuda bibin, usan jî kesî nedigot.

Di gundê wan de şeş malên azariyan û du malên ermeniyan jî hebûn, lê ji wan re kesî tişt nedigot, ew di şûna xwe de diman.

fîin û girî ketibû gund. Hinek bi kar çûbûne gund û bajarên mayîn, hinek çûbûne malên qewm û pismamên xwe. Merivên gelean li gund û bajarên mayîn diman. Ê niha kesî nizanî bû, gelo wê wan jî sirgûn bikin, yan ew ê di ciyê xwe de bimînin. Eger wan jî cîguhastî bikin, gelo wê gişkan bibine ciyekî, yan heta û hetayê ew êdî hevdu nabînin.

Çend zarên gundiyan li Rewanê dixwendin. Rast e ji wan re gotin wê wan bigihîne dê û bavan, lê dîsan jî ditirsîyan, êdî kê baweriya xwe bi vê dewletê dianî. Çavên merivên wan hema usan li rê bû.

Lê çawan jî hebûya divêt tivdarekê xwe bikirana. Silo, gava pir hindik bi meselê hesîya, temî da jinê, wekî him tendûra wan, him jî ya mala birê dadin û du destan, çiqas dikarin nan bipêjin. Berê fikirîn bi sêlê wê hê zûtir bibe, lê nanê sêlê zû karto dibû. Wî usan jî temî da wekî poxîne çêkin.

Tu kesî nizanî bû hela çi wê bê serê wan, lema jî divêt tivdarekê xwe baş bikirana.

Tiştê berbîn ew bû, wekî demsal baş bû. Çawan jî hebûya, gişkan jî pir, hindikî zimêrê zivistanê dabûne ser hev, tiştên hildanê bawer bikî di mala gişkan de hebûn. Ma hela wê çiqasî bihêlin bi xwe re hildin.

Silo ji kur ê xwe re got:

— Lawo, tu jî rabe, nogina sor ji tewlê derxe, heta ez kêran tûj dikim.

Buka Silo, ya du hefteyan, wekî çavniherî bû malbavan bêne sertêdanê, di qulçekî malê de qincilî bû û xulexula hêstiran bû, ji çavên wê yên kildayî dihatine xwar. Xêliya bûktiyê hê jî li dor guhên wê pêçayî bû.

Mala bavê wê li Rewanê dima û marûma Xwedê nizanî bû ka çi wê bê serê wan. Mêrê wê li ser qutîke biçûk ber stêr rûniştî bû û cigare li pey cigare vêdixist. Wî car caran di bin çavan re li jina xwe diniherî û kizîn ji dilê wî dihat. Dixwest wê demê rabe, jinê hemêz bike, çavên wê yên ji hêstirên şor sor bûyî ramûse û bi gotinên xweş wê aşt bike, lê ji neferê malê, ji dê û bavê xwe şerm dikir. Gava bavê seva noginê jê re got, wî cigara destê xwe hema di cîh de avît, bi pozika pêlava xwe vêsand û bêyî dilê xwe ji cîh rabû.

Piştî nîvro, gava bawer bikî tivdarekê wan êdî gişk kirî bû, Silo gazî jinê kir û ji wê re got:

— Evda Xwedê, kî zane wê çi bê serê me, careke din riya me wê bi vira keve, yan na. Ka em herin xatirê xwe ji goristanê jî bixwezin. Paşê çi tê serê me, êdî ew xwestina Xwedê ye.

Goristan ji gund dûr bû. Gava wan ranêzîkayî li goristanê kirin, dîna xwe danê, li wir êdî tijî meriv in. Tê bêjî di berê de ji hev re gotibûn, bawer bikî gundî gişk li wir bûn.

Birînên gişkan teze bûbûn. Yekî nenas li wir bûya, wê bifikirîya mirivên gişkan di van herdu rojan de mirine. Zêwîna ketibû goristanê dil û hinavê merivan disot. Mêr ker û lal, dest tev wer kirî rawestîya bûn, jin digirîyan û dilûbandin.

Jineke bûkîn xwe avîtibû ser tirba kurê xwe û zarezara wê bû. Ji axa ser tirbê kivş bû, wekî mirî teze ye. Jinika marûm li xwe dixist, dixwest xwe bikuje, wekî wê jî li keleka kurê wê çel bikin. Wê nedixwest kurê xwe tenê bihêle.

Mêrê wê jî ji alîkî ve milê wê girtibû, dixwest rake, ji aliyê mayîn ve xulexula hêstiran bû ji çavên wî dihatine xwar.

Ew kesên miriyên wan li vê goristanê tune bûn jî, dîsa hatibûn. Ew jî li dor tirbên merovên xwe, cînarên xwe ber hev bûbûn û miriyên xwe, yên li Wanê hiştî bi bîr danîn û şîna xwe dikirin.

Lê dirêj neman. Roja wan a dawiyê bû li welêt. Cara dawî wê gundê xwe, xaniyên xwe yên ko bi destên xwe ava kiribûn, çîyayê Agirî ko li pêşberî gundê wan bû, bidîtana.

Ro êdî xwar bûbû pişt çîya, gava kamyon ketin nav gund. Mal bar dikirin û bi neferan ve dibirine ber riya trêne, hinekî ji stansiyonê dûr peya dikirin. Trêna bi vagonên barbir êdî li benda wan bû. Çarnikalî trêne saldat bûn, tiving di milên wan de. Bi hinekan re se jî hebûn.

Kamyon çawan digihîştine cîh bi carekê ve paşîyên wan didane ber derê wagonan û nefer, hûr û mûr gişk bar dikirin. Gava wagon tijî dibûn ji derva ve derên wan dadidan.

Vagonên derî dadayî hê demeke dirêj usan man. Pencere tune bûn, tenê ji qelîştekan re te dikarî bû bidîta ka çi li wir dibe. Saldatên seyê girêdayî bi wan re, hema usa di ber wagonan re diçûn, dihatin.

fiev êdî nîvî bûbû, gava trêna rêket. Jinan hê jî dilûband. Silo mîna zarokan xwe dabû ber dîwarê wagonê û ji qelîştokan re li derva dinihêrî. Wî ji der û dora rê texmîn kir, wekî wan ber bi Gumiriyê dibin. Wî ev rê baş zanî bû, bi vê rê ew pir caran çûbû Tilbîsê. Saetekê zêdetir wî usa ji qelîştokê li derva dinihêrî. Trêna hêdî diçû û li stansiyona ranediwestîya.

Hê jî îskeîska jinê bû. Paşê ew rabû, lempe derxist, vêxist û ji bizmarekî dîwarê wagonê ve darda kir. Gava hundurê wagonê hinekî bû ronahî, Silo vegeerîya û li neferên xwe nihêrî. Her yek li cîhekî qincilî bû. Gişk peşmorde, gişk bi mede û mirûz. Kela Silo tijî bû, dilê wî êşîya, usa jî diltenik bû, çavên wî zû bi zû tijî hêstir dibûn. Lê çawa mezin, çawa malxuwê malê, xwe zevt kir û dîsa berê xwe ji wan guhast. Demekê usa ma heta kela wî danî, paşê vegeerîya ser jinê:

— Keçê, ka pariyek şîv ji zarokan re dayne, bira bixwin, razên, ka heta sibê Xwedê çi dike.

— De bise, zarok ji birçîna namirin, ez niha ji we re daynim, hûn bixwin, zarok ê paşê bixwin.

— Ez naxwim, madê min tune.— Silo rojekê berê li aş bi hevalan ve nan xaribû. Li goristanê jî wî destê xwe neda tişteki.— Bira zar bixwin, razên, ez ê paşê bixwim.

Lê çawa jî hebûya piştî demeke ne dirêj her yekî tişteki kirine devê xwe û dîsa çûn di ciyên xwe de qincilîn. Paşê herke kulav bû, herke cil bû, raxistin, lempe vêsandin û nefer her yek li ciyekî telîya.

Silo, pişta wî li dîwarê vagonê çarmêrkî rûniştî, li pêşiya xwe dinihêrî, lê tiştekek nedidît. Di nav tariya six de tu tişt nedihat xuyanê. Çavên wî jî êdî diçûn ser hev, lê berî bi xwe re here hê karekî wî hebû û wî hêdîka ji jina xwe re, ya ko hinekî dûrî wî rûniştî hê jî lûbelûba wê bû, got:

— Keçê, ka rabe em ji neferan re sitarekê çêkin.

— Te çî got,— jinê gotina wî nebihîst.

— Çî ye, tu ker bûyî, ez dibêm em ji neferan re sitarekê çêkin.— Silo bi xwe jî nizanî bû ji bo çî ser jinê de hêrs dibe.

— Di vê tariyê de ez a marûma Xwedê çî dikarim bibînim ko bidime te. Çî jî hebû zarokan avîtine bin xwe.

— Çira çawa bû, qet tiştekek nemaye?

— Hebe jî ez niha nikarim bibînim. Bira bimîne sibê. Çawa nefer tev rabûn, ez ê tiştekekî bikim.

— Na, heta sibê nabe.— Silo hinekî fikirî û dîsa vegeyîya ser jinê.— Ew çî bû gava din li wir qatkirî danî bû?

— Kî derê?

— Li wir, li rex ciyê niha tu lê rûniştî.

— Emenî a ser stêr bû. Dîsan li wir e, min danîye ser nivînê mêvanan.

— De hela rabe wê bîne.

— Pî, heyfa wê emeniyê nîne, ew ya ser stêr e. Bihêle, tu çira usa bêsebir bûyî, sibe ron be ez ê tiştekekî bidime te.

— La mala xweyê te şewitîyê, li pey çî ketîye, ha!

Silo hinekî bê deng ma, paşê gotina xwe bi pêş ve bir:

— Niha heyfa me gerek tenê bi namûsa me bê, wekî mayîn hertişt çû. Heyfa te gerek êdî bi tu tiştê mayîn neyê.— Dilê wî tijî bû, deng lê diqusîya.— Ka, me bi çî talî, tengîyê ji xwe re xanman çêkir, navmal danî, ka gişk li ko ma? Di nav deh salan de ev jî cara sêyemîn e ko em weha koçber dibin. Tu çî zanî hela wê ci bê serê me. Serê me serê xêrnediyan

e, xêrnediyan! Ne welatê me heye, ne xweyê me heye. Nolî hola me ji wî alî davêjine vî alê, ji vî alî davêjine wî alî. Rabe, rabe emeniyê bîne, em sitarê çêkin, xewa min jî tê. Eva êdî şeva duyemîn e ez ranezame.

Jin bêyî dilê xwe ji cîh rabû û emeniya li ser nivînê qatkirî danî î anî û da mêr. Silo êdî ciyê dardakirina wê di qulçekî vagonê de raçev kiribû. Wan bi hev re qulçê vagonê vala kirin û emenî usan darda kirin ko li pişt wê star çêbe.

Emeniya bi nexşê Kirdasî, sala zewaca wan, ya yekemîn jinê bi destê xwe çêkiribû. Nexşekî bedew bû, pir caran keç û bûkên gund dihatin, wekî nexşa ji ber bigrin.

Du hefteyan berê ev emenî perda bûkê bû. Hingê di hewşa mala wan de ringeringa defê bû, mirazê Silo, yê lapî mezin dihate sêrî. Wî kurê xwe, yê nuxurî anîbû ber zewacê. Hingê ringeringa defê di nav dil û canê wî de bi hezar û yek awazî alan dida, jîyana wî bi şabûn dixemiland. Lê niha ew emenî girêdida, wekî seva neferê wî starek hebe. Niha teqeteqa tekên vagonê tê bêjî girmîniya çakûçên hesin bûn ko li serê wî dixistin.

Ringeringa defê ber bi miraza dibir, ber bi şabûnê dibir! Wê ringeringê maleke nû ava dikir! Lê ev teqeteqa tekên vagonê, wekî mala wî êdî wêran kirine, wê niha wî kuda bibin?

Silo neferê birayê xwe î biçûk jî anîbûne vagona xwe.

Sefo ê bira di gund de mamosta bû. Lê dawiya buharê, gava mal teze çûbûne zozanê Axmixanê, di gund de civat kirin û Sefo jibartin serokê sovêta gund, wek muxtar, wek kalê gund nav hev de ew nav dikirin.

Lê wî tenê du mehan serwêrî kir. fievekê jî bi erebeke reşe sergirtî hatin, ew ji nav nivînan derxistin û birin. Ew birin bû ko birin, ew êdî hew vegeyîya. Du mehan ew di girtîgeha Rewanê de bû, lê piştî du mehan ew şandine Rûsîyayê.

Çar zarê Sefo hebûn; sê keç, kurek. Kur yê biçûk bû, sê salî.

Bavê gelekî ji kurê xwe hiz dikir. Jê re digot Memê Alan! Pey girtina bavê re tê bêjî gişkan xwest wê valayiyê tijî bikin. Memê bû hizkiryê gişkan, delaliyê gişkan. Û dema dawiya hefteya koçberiyê, ya duyemîn Memê bi navêşê ket, ew ji bo gişkan bû xema lape mezin. Nava wî nolî avê diçû. Serdapê dişewitî, dikirin, nedikirin germa wî danediket.

Trên li cî cîyan radiwestîya. Derê vagona vedikirin û destûr didan, wekî ji xwe re avê hildin. Lê zêde kesî nikarî bû gavek biavêta. Saldatan, tivingên wan di destên wan de, qetê segan hişk girtî û dor li wan digirtin.

Silo timê bi xwe peya dibû. Wî bawerîya xwe bi kesî nedianî. “Xwîngerm in, te hew nihêrî şaşiyek kirin, saldata jî gulle berî danê. Kê ji kê ye. Di vî welatê wêran de ne merivatî maye, ne jî zagûn” – ew difikirî.

Carekê jî, gava Silo peya bû ko avê hilde, dengê girî kete guhên wî. Çiqas jî di vê trêne de dengê girî ne tişteki metelmayîne bû, lê dîsa jî ev girî ne wek giriyên mayîne bû. Çend mêr û saldat li hev qelibî bûn. Jinan li xwe dixist. Hela du gulle jî hatin agirkirin. Silo xwest nêzîk be û bizanibe ka çi bûye, lê saldata rê nedayê, wan ew vegerandin. Rojtira mayîne gundîkî wan ji Silo re got, wekî kalek çûbû dilovaniya Xwedê. Saldat ji xweyê mirî re dibêjin, wekî çawa bigihîjne stansyonê, ew dikarin peya bin, miriyê xwe çel bikin. Lê çawa trêne radiweste, saldat dikevîne vagonê, termê mirî hildidin û dibin. Nahêlin tu kes ji mirovên wî bi wan re here. Ew termê mirî didine karkerê stansiyonê ko bispêrine xweliyê. Hela ser de hindik mabû kurê wî merivê mirî jî bikujin.

Ji wê rojê de, gava trêne radiwestîya saldat nêzîkî deriyên dibûn û dipirsîn ka miriyê kê hene. Her car tê bêjî ew gotin dibûne xencer û dil û hinavê Silo dixîvandin.

Memê bi ser xwe ve nedihat. Her caran, gava çavên Silo li biraziyê nexweş diket, tirseke bêwa dikete dilê wî.

Kurik roj bi roj sist dibû, tiştê nedixwar û nava wî jî hema usan nolî avê diçû. Rojekê jî jina Silo êdî tap nekir:

— Kurik ji dest me diçe, malwêran, tu çi dikî?

— Ez ê çi bikim,— Silo zarî bû,— kevir û kuçikê Xwedê ser me de bibarin, wekî barîne, ka çi ji destê me marûmê Xwedê tê, wekî em çi bikin.

— Lê îcar bû, em hema destê xwe tev werkin, rûnîn?

— Lê em ê çi bikin, zulma Xwedê ye di ser me de hatîye.

Gişkan jî zanî bû, wekî weha here kurik ê ji destê wan here û her yekê dixwest ji aliyê xwe de rêyekê bibîne.

— Hema dûkî, dermanekî, lê weha dibe?— Jinê dixwest ese tiştê bê kirin. Bûka teze, ko heta niha tev tu tiştî nedibû, nêzîkî keça Silo ya biçûk bû û di guhê wê de kire pistepist. Keçikê pašê ji mezinan re got, wekî navê derman dibêje û ew derman wê bi carekê re nava kurik bibire.

— Vê carê em çawa gihîştine stansiyake mezin, ez ê peya bim û ji saladata lava bikim, wekî bihêlin ez herim ji avdêrkê derman bikirim.— Kurê Silo got.

— Na, ez ê herim!— Silo nehişt ew gotina xwe temam bike. Saldatên se bi wan re bi carekê ve hatin ber çavên wî. Berê bûya dibe kur bixwesta gotina xwe bibe pêş, lê niha tê bêjî ew bi zagoneke ne nivîsar, bi qeyde û qanûnên taybetî dijîyan. Silo serok bû û gotina wî kêta kêvir bû, tu kesî nikarî bû biguhasta.

— Tu ê bikaribî navê derman di bîra xwe de xweyî bikî?— Kur jê pirsî.

— Hun ê navê derman ser kaxazekê binivîsin, bidine min, gava ez çûme avdêrke, ez ê nîşanî wan bikim, wê derman bidine min.— Bi teherekî wî çend gotinên rûsî jî ser hev de anîn, wekî ji saldatan re bêje.

Du rojan Silo, kaxeza bi navê derman di beriyê de, li benda stansiyona mezin bû. Lê te hew dinihêrî trêna li çolekê, yan stansiyoneke usa radiwestîya, wekî tenê holikek, yan jî du holik hebûn.

Nexweşiya kurik roj bi roj girantir dibû. Çaya giran, poxîn, birincê kelandî, êdî çi bêjî dane kurik, lê gişk bê fêde bû. Kurik reng lê teyîsî bû, çav di kor de çûbûn, êdî hew karibû xwe li ser piya bigire.

Silo nedihîşt jinik li ber kurik bigirîn, lê bi xwe jî ancax xwe zevt dikir. Wî bi çavên xwe didît Memê, tayê tenê, ko dewsa warê bavê xwe mabû, çawa roj bi roj ditemire. Carina wî piştî xwe dida neferan û hêstir di ser qerçomekên sûretê wî re hol dibûn xwarê û nav rîdana wî ya sê hefteyan kurnekirî de, unda dibûn.

Jîyana wî bi rojên giran tijî bû; rev û bez, girtin û lêdan.

Gava cenga cihaniyê, ya yekemîn dest pê bû û li Kavkazê têkilî, pêwendiyên navbera xaçparêz û misilmanan sert bûn, wan xanî û gundên xwe, milk û zeviyên xwe, goristanên kal û bavên xwe hiştin û koçberî Wanê bûn, nav êla birûka. Qey bêjî êdî bi cîh û war bûbûn; êdî ji xwe re xanî ava kiribûn, çandinî dikirin. Lê piştî têkçûna şorişa fiêx Seyîdê Pîranî tirkan êrişî gundên wan kir. Vê carê jî ji bo neferên wan nekevîne destê Roma reş, wan dîsa bar kir û derbazî Yekîtiya Sovêtê bûn.

Hingê wî zanî bû ew rev û bez, ew koçberî ji bo çi ne. Lê vê carê ji bo çi ew cîşihitî kirin, wan bi kuda dibin û wê çi bê serê wan, kesî nizanibû. Hê rast, yê zanibûn nedigotin.

“Ya Rebî, gunehê me çi ye? Gunehê van kal û pîran, van jin û zarokan, van bûk û zavên teze? Gunehê vî kurikî, vî teyrikê buhuştê çi ye, wekî awa bêxeda ber çavên me ditemire? Xwedê bê Xwedê, ev çi zulme? Ne em ji zulma Roma reş revîn, wekî xwe bigihînine welatê aza, wekhevî û rastiye. Lê ka, azayî û rastiya wan li ko ye? Ne ji me re digotin ev hukumata piştovana marûm û belengazan e, piştovana karker û cotkaran e? Çira ji me marûmtir, belengaztir meriv hene li rûbarê dinê?” – Wî di dilê xwe de digot.

— Bavo, em dikevîne bajarekî mezin.— Kur Silo ji nav mitalan derxist. Silo nêzîkî qelîştoka derê vagonê bû. Rastî jî trêna di nav bajarekî mezin re diçû. Li herdu aliyên rê avayên mezin bûn, trêna jî bayê xwe sist dikir.

Bajarekî şên dihat xuyanê. Li stansiyonê meriv pir bûn, dikan hebûn. “Usan e avdêrk jî wê hebe.”— Silo fikirî.

Çawa derê vagonê vekirin, ew zûzûka peya bû û ber bi dikanan çû.

— Kuda, kuda,— saldatek di ser de qûjîya.

— Derman, derman, bolnoy, bolnoy (*) – Silo xwest bi saldat bide famkirin.

— Nazad! (***) – saldat lûla tivingê rastî Silo kir. Silo di ciyê xwe de sar bû û nizanibû çî bike. Çend saldat bi kûçikan ve nêzîkî wî bûn. Xwîna Silo hevraz avît, ji hêrsa ber çavên wî reş bûn, lêlê bû bi diranan zengûlekên wan qet bike, lê xwe zevt kir. Wê ewqas nefer di stûyê kê de bihîştana? Wî demeke kurt li çavên wan nihêrî, paşê destê xwe hejand û por poşman vegeerîya vagonê. Neferan ew gişk bi çavên xwe dîtin, lema jî gava Silo hilkişîya vagonê tu kesî tişt jê nepirsî. Wî bi xwe jî tişt negot, ji hêrsa çîla bûbû, reng lê çûbû. Lê ne ji tirsê. Niha ew êdî ji tu tiştî neditirsîya. Wî tenê nedixwest van neferan, vê mala giran, sêwiyên birayê xwe stuxwar bihêle. Ser tirsê re wî êdî ji mêj ve gav dabû.

Silo li cîhekî din jî xwest ji bo derman peya bibe, lê vê carê saldata qet nehişt ji vagonê jî bê xwar. Ê ji hertiştî zivêr, hêviya xwe ji hertiştî birîyî, li rex derê vagonê çarmêrkî rûnişt. Niha Ezrahîl jî li ber çok bida, canê wî bixwesta, wî ê tu tişt negota, qet ji ciyê xwe jî nedilipitî.

Vê carê jina wî êdî tap nekir, saldat tev dan, ji vagonê peya bû û kire girî. Saldat li dorê ber hev bûn, ofîsêrek jî hat û bi alîkariya werger pê hesîyan, wekî nexwaşê wan heye û derman gerek e. Ofîsêr ji wê re got, wekî dema here vagona xwe, wê ji nexwaşê wan re derman peyda bike. Rastî jî piştî nîv saetî dermanek anîn.

Lê kurik êdî ji taqet ketibû. Heta nikaribû derman jî daqurtîne. Çawan jî hebûya, bi teherekî derman di gewriya wî de kirin xwar.

Derva zivistan bû. Herdu aliyê rê xalî bûn. Bi seda kîlomêtra beriyeke bê serobin bû, bi spîçala berfa qerqaş nixamtî. Usa dibû, şeş, heft saetan trêna diçû û li ser rê tu şênî tune bûn. Carina ba radibû û dikire fizildûmaneke usa, wekî te digot erd û esman tev li hev bûne. Ji merivan tirê ew ji sînore dinya şên derketine, ketine cîhekî usa ko hê pêyê kesî lê neketîye.

Tarî kete erdê, Silo bi xwe jî texmîn nekir, çawan bi xew re çû.

fiev êdî nîvî bûbû, gava ew ji qêrîniya jinan hişyar bû. Wî çavên xwe vekirin û dît ko jina birê wî li serê xwe dixê, serçavên xwe pencirûk dike. Bêguman wî texmîn kir ko çi bûye, lê bi carekê ve ji cîhê xwe ranebû. Berî gişkî, nolî birqa birûskê di fikra wî re derbas bû, wê çawa biraziyê xwe, tayê tenê, delalîyê gişkan, li vê beriya xalî, bê xweyî û bê xudan bihêle. Û bi carekê ve biryar girt, wekî termê biraziyê xwe wê nede saldata. “Yeke dinya sar e, sovê jî wê kêr vêxin. Em ê termê kurik li qulçekî ji sovê dûr xweyî bikin, heta digihîjne cîh. Li kîderê em cîh bûn, ez ê biraziyê xwe li wir jî bispêrme erdê.”

Pey vê biryarê re rabû, çû ber termê biraziyê xwe çok da, eniya wî ya ko êdî sar dibû maç kir, paşê keça birê, ya ji dengê girî hişyar bûbû, hemêz kir û azayî da hêstira. Nefer gişk tev rabûn. Zêwîn kete vagonê. Mêr, jin, keç, kur, gişk digirîyan.

Li welêt şîna weha nedikirin. Beguman digirîyan, dilûbandin. Lê der, cînar, qewm û pismam di ber dilê xweyê şînê de dihatin, ew aşt dikirin, mijûl dikirin û şîn teherekî sivik derbas dibû. Lê niha gişk digirîyan û kesî aşt bike, ber dilê wan de bê, tune bû.

Ev şîn û girî wê dirêj dom bikira, eger Silo texmîn nekira, wekî trêna bayê xwe sist dike. Wî carekê jî guhê xwe da ser dengê tekê trêna û ji nefera re got:

— Hela hiş bin.— Lê jina tê bêjî dengê wî nebihîst.— Keça Qaso, ne ez ji te re dibêjim,— wî ji jina xwe re got.— Niha trêna ê bisekine. Hûn gişk, xên ji Meyana bûk ji termê kurik dûr bikevin û dengê xwe bibirin. Herkes bira bi tiştêkî ve mijûl bibe. Ez termê Memê xwe tu cara nadime destê van kafiran.— Ser van gotina dîsan kela wî tijî bû û xizîn kete dengê wî.— Ez serê xwe jî bidim, termê biraziyê xwe nadim. Ne silametî em bigihîjne cîh, eger cîhê usa di vî welatê wêran de hebe, ez ê li wir jî termê biraziyê xwe bispêrime xweliyê.

— Ewdê Xwedê, gune ye tu ê çawa termê kurik bihêlî. Ne divêt hema îro bispêrine xweliyê. Tiştê ko tu dibêjî bi Xwedê xweş nayê.— Jinê bi dengê nimiz got.

— Lê ev halê me bi Xwedê û pêxembera xweş tê, erê? De hiş be, êdî hêrsa min raneke. Min di jîyana xwe de pêl mûrîstaneke nekiriye. Nimêj û rojî, min hertişt li gor gotina pêxember kir. Lê ka çî hate pêşiya min?

— Xwe ber Xwedê gunehkar neke, bêhna xwe fireke.

— Min got, hiş be, îcar ji min re bûye melle.

Jinê êdî dengê xwe nekir. Yêna mayîn jî yeko yeko, bêdeng ji term dûr ketin û niha dewsa dengê girî, tenê îskeîska fetisandî dihat. Êdî bêdeng di xwe de dikewgirîn.

Trêna rawestîya. Silo vê carê ji vagonê nehate xwar. Wî derdan dane destê kurê xwe û jina wî û şandin wekî avê hildin. Ew bi xwe ber derê vagonê ma.

Saldatek bi xortekî kurd ve ko werger bû, nêzîkî wî bûn û xortê kurd ji Silo pirsî:

— Miriyê we hene?

Silo bêdeng destê xwe bi nanakî hejand û berê xwe ji wan guhast.
Dema derê vagonê dadan û trêna dîsa bi rê ket, gişk dîsa li dor termê kurik ber hev bûn û şîna xwe kirin.

Piştî mirina Memê roja çaremîn giştine cîh. Hema ji vagonan ew kirine erebên barbir û wek çar saetan jî ew bi ereba diçûn, heta gihîştine devê çemekî biçûk. Ji wan re gotin, wekî hinekî bîna xwe bistînin, va merivên dîwanê wê bîna û bi pîrsa wan ve mijûl bibin.

Dor wan beriyêke bêserobin bû. Tenê cî cîyan ji rasta beriyê topikên biçûk bilind dibûn. Wek kîlometrekê ji wan dûr, li ser milê çepê gundekî ji deh dozdeh xaniyan dihat xuyayê.

Hê wan koça xwe gişk peya nekiribû, siwarek hat, hinekî ji dûr ve li wan mêze kir, paşê serê hespa xwe zivirand û çû.

Di dû peyakirina koçê re Silo li dora xwe nihêrî. Di fêza wan de çend topik hebûn, wî texmîn kir, wekî yekî ji wan dikarin bikine goristan.

Ro êdî bejneke bilind bûbû. Çawan jî hebûya, gerek kurik wê rojê çel bikirana. Heta kurik çel nekin, nikarin tu karî bikin. Lê li pêşiya wan hê çiqas kar hebûn.

Wan hê hûr mûrê xwe cîh dikirin gava ji aliyê gund vê carê çar siwar hatin. Yek ji wan xort bû, lê hersêkên mayîn mîrên navsere bûn.

Silo cara yekemîn merivên usa didîtin. Rengê wan tê bêjî qimilî bû, dêmê wan gulover bûn, hestuyên ber çavan hinekî bel. Lê ya lape ecêv çavên wan bûn; hûr û dirêjoşkî. Ew nêzîkî koçê bûn û silav dane wan:

— Selam, alêkûm,— Silo zendegirtî ma, nolî eşîran silavê didin. Paşê wan çend tişt jî gotin û Silo texmîn kir, wekî zimanê wan nolî zimanê osmanîyan e û ew hinek gotinên wan fem dîke.

Bi gilîkî wan hev da femkirin. Tişteki ko berî gişkî ji Silo re bû berbîn ew bû, ko ev meriv misilman bûn. Lema jî wî bi carekê ra ji wan re got, wekî miriyê wan heye û divêt ese çel bikin. Gava ew di derheqa mirî de pê

hesîyan, mêrekî xortê bi wan re hatî tek kir û ji wî re tişteki got. Xort li hespa xwe siwar bû û berê xwe da gund.

Jina ji bo şuştina mirî av germ dikirin, gava ew xort bi çar xortên mayîn ve hat. Wan bi xwe re perçe bona kefen anîbûn.

Kefen, kevirê giran bû li ser dilê Silo. Ew hê di trê de kefen difikirî. Wî ji jinê jî pirsî, lê perçe sipî, ko dest nedabûnê tune bû. Û wan qirar kir şeltê orxanekê derxin, bişon û bikine kefen. Çi bikirana, tu çara mayîn tune bû. Lê heta derxistana, bişuştana, ziha bikirana, pir wext wê biçûya, ew jî vê zivistana sar.

Heta mirî şuştin, kefen kirin, kome mêr û jinên mayîn jî hatin. Jin çawa ji erebê hatin xwar, çûn li dor termê mirî rûniştin. Mêran barê erebê peya dikirin: tûrek tijî birinc, sê çar nanê petî û du semawer ji bo çayê.

Silo ew gişk didît û ji çavên xwe bawer nedikir. Di pey ewqas tiştên dîtî re, ji wî tirê dinya êdî welgerîyaye, ew bi neferan ve di derê dogehê re ketine hundur. Merivatî, camêrî, dilovanî, gişk li wî alî dinê, li dinya ronik mane. Lê mirovahî û dilovaniya van merivên nenas, ko Silo heta niha qet di xewnê de jî nedîtibûn, ji wî re bûn berbîn.

Usan e hertişt hê unda nebûye, hê jî hêja ye ko meriv bijî!

(...)Bolonoy: Bi zimanê rûsî ye, tê maneya nexweş e.

(...) (...) Nazad: Bi rûsî ye, tê maneya yan şûn de.

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: TOSINÊ REŞÎD

Weşandin: 2005-06-27

Xwendin: 10220

**

Gulê

Gundî di mêvanxana Reşo de rûnişti bûn û daxaftin. Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê şadiyan di nêzîk de wê biketa axa bav û kalan.

Herkes diponijî û li çarekê digeriya.

Ezman girtî bû; bandevêkê ji reşiya şevê re hîn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyar, Qoçoyê pola, bi heşt mirovên xwe ve ket hundir. Cilên wan şil bûn; av di tivingên wan re dihate xwar. Gundiyan gişan dan ber qîran: “Polayê kurd, sergevazê çiyayên Kurdistanê fermo!” Lê Qoço rûnenişt, di nîvê odê da ma û wek serdarekî bi dengekî xurt û gur gote wan: “Gundîno! ev panzde sal in ko ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnedîtî de hatin gotin, lê ji dihî vir da ji devê ti kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemiyan, ev şev, li ser axa welêt şeva me a dawiyê be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwariye ko dijmin ji welêt derêxim”.

Sorahiya rivîna agirê êzingan di tifikê de li dîwaran dihejiyan. Pola li dora xwe dinêrî. Çavên wî diçirisîn. Çil gundî tevde rabûn û gotin: “ Em jî sond dixwin, em jî bi te re ne, pilingê kurd!”

Di wê gavê de, ji nişkê ve derî vebû, jinikeke zirav, narîn û şîrîn, wek pelekî dara bişengê li ber bayî, ket hundir û got:

“Ez jî bi te re me, ez jî mêrê Pola!”

Gundiyan gişan bi dengekî weke ken kir qîr:

“Gula qehpik! Gula bê namûs!”

*

Gulê ji gund bû. Berî çend salan bavê wê bi zor ew da bû yekî. Gulê rojekê mêrê xwe kuştî bû, ketî bû pê Qoço û li serê çiyar pê re digeriya. Gundiyan bi çavekî ne baş lê dinêrîn, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên xwe her gav lê digirtin. Ji tirsê Qoço ne bûya belkî ew dikuştin. Lê, ne tehqîra gundiyan, ne jî tajanga Qoço ji Gulê re ev rê ne dida berdan. Gava

Qoço ew dida ber tajanga, Gulê digot: “Li min xe pilingê min! Li min xe! heya destê te biweste! Tu jîna min î! Ez goriya te me. Bê te ez nabim!”
Di çiyân de bi Qoço re ger, di şikeftan de raketin, di berfê de qufulîn, jê re bextiyariyeke mezin bû.

*

Wê şevê Gulê dîsa digirî, lê îcar ne ji êşa tajangiya Qoço ve ko wek marekî xwe li bejna wê a zirav dipêçand. Xew, qet ne diket çavên wê. Dijmin dê biketa welêt... Rojên geşî ji bo wan ne diman. Her tişt dibû xeyal. Dengê topên dijmin gelek nîzîk dihatin bihîstin... Çiyayên Qoço ên serbest diketin destê dijmin... Jina gund a pîs li ser vî halî bi girîn difikirîn. Li çara xelas bûnê digeriya. Divî bû ko gundê xwe, welatê xwe, çiyayê xwe û serbestiya pilingê xwe”Pola” ji dijmin biparêze. Ji nişkê ve rabû. Tiştê hati bû bîra wê. Xencereke bi şiv girt. Ji şikeftê derket. Riya aliyê dijmin girt û winda bû.

*

Qoço, bi çil gundiyên xort û mêrxas ve li pêş dijmin kemîn girti bûn. Hingûra şevê bû. Li ser çiyayê bilind, nîvreş heyveke sor bi dilekî şikestî hêdî, hêdî hildihat. Dengê topan hati bû birîn. Pola çavên xwe li ser çiyayên xwe; li ser warên xwe gerand û bi keser li wan nêrî:

Wî sond xwari bû; gunehên xwe yên pazde salan wê bi destê xwe rakirina, ne hişta ko dijmin derbasî tixûbên welêt bibe...

Di dilê wî ê pola de agirê serbestiyê pêketi bû. Wî tu caran wek wê şevê hej kuştin û helanîna tola xwe ne kiri bû.

Demekê, Gulê hat bîra wî. Wî hej vê jinikê dikir. Li dora xwe nêrî; li Gula xwe ya ko wek sihekê jê ne dibû ne dît.

Di wê gavê de nêrevanekî wan got: “Bala xwe bidin! ji aliyê dijmin yek tê.”

Siha ko xweya fikir bê tirs û telaş dihat. Dengê şikên wan rakirin: “Ev Gula qehpik e!”

Gundiyeke din got: “Qehpikê em xistine xefkê! Tifingê berdê, Pola! Ew rêberiya dijmin dike!”

Qoço rûyê xwe tirş kiri bû; birihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinêrî. Wî jî gotinên gundiyan rast didîtin.

Gulê li cem dijmin çî fikir? Ne xwe cihê wan şanî dijmin kiri bû... qehpitî kiri bû.

Qoço di bin ronahiya heyva sor re tifinga xwe dirêjî Gulê kir û got:

— Ha ji te re, Gulê! Berî dijmin berika pêşîn para te be...

Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrîşim raxiste erdê.

Piştî Qoço rabû ser xwe û ji gundiyan re got:

— Zû bin hevalino! Em ê nixta dijmin bigirin!

Çûn. Lê dijmin bê liberxwedan revîn. Kurd ketin asêgehê; her der vala bû. Bi tenê di odekê de tiştê ecêb dîtin. Serê zabitê dijmin ji laşê wî hati bû birîn û mezê bi xwîn bû. Li ser nivînê xencereke bi xwîn diçirîsî.

*

Qoço xencer rakir; wî ev xencer dabû Gulê? Di kulma zêbit a guvaştî de gurzek porên Gulê ên zer pêl dida.

Qoço kulmikên xwe gez kirin û wî pilingê ko çiya dihejandin ji bo cara pêşîn girî û gote gundiyan:

— We bi min gunehê paşîn da kirin, ji Gula qehpik re me qehpetî kir!

Bi dengê têrêş, têrpoşmanî û têrbirîn gotina xwe a paşîn kir:

— Gulê! Te deynê xwe da, te gunehên xwe rakirin! Niho dora min e, Gulê! Gula min a zer!

Bi xencera xwîndar wek bayekî ji odê derket, berê xwe da dijmin û nema xweya kir.

Serkanî: Hawar, hej. 29, Hezîran 1941

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: NÛREDÎN ZAZA

Weşandin: 2005-06-26

**

Eyloyê pîr

Mîr Tacîn pîr bû, lê di qesra wî de carîyên spehî û ciwan hebûn û hemiyar hej Mîr dikirin, ji ber ko ew xweyagir û xurt bû. Maçên wî şêrîn û germ bûn. Jin hej ramûsanên şêrîn û germ dikin. Ji xwe jin, ji zelumên hevîngerm û hîskûr hej dikin, ew zelum ciwan an pîr in yek e.

Xortî hevîn e, xoratiya rivîna dilî ye, ne çermê ter û lumên qirmizî ne.

Hemîyan, ji pîrî hez dikirin, lê pîr tinê hej yekê ji wan dikir, Perîxanê keçikeke şingarî.

Di mala wî de sêsed carî hebûn, porzer û çavheşîn, porreş û çavkesk, diranmirarî û lêvgul û hemî jî wek ronîya roja gulanê zelal û wek kulîlkên meha Avdarê spehî bûn. Lê kesekî ji wan hinde keçika şingarî hevîn seh ne dikir û hejkirina wê qasî a şingarî têr pel û pereng nebû.

Ev sêsed jin bi xwarinên tamdar, bi bêhnên xweş, bi şêraniyên spehî wextên xwe diborandin. Bîhna xwe bi blûr, kemançe, bi dehûl û erebane, bi stranên çak vedikirin. Mîr pîr caran ba xwe ban şingarîyê dikir.

Li cem mîr her tişt hebû, dewlemendiya dinê, sipehîtiya jinan, rengê mirarî û gewheran û xweşdiliya azahîyê.

Di koşa qesra xwe de canê xwe ê westayî divêsihand û rojên jîna xwe ên paşîn bi kêyfê diborandin.

Kurê wî Gurgîn xortekî camêr û mêrxas bû û navê bavê xwe her bilindtir dikir. Ji talanên wî gencîneyên qesrê û xezîneyên serayan tejî bû bûn.

Mîr Tacîn ji Gurgîn re her bi çavên hejkirinê mêze dikir. Wî dizanî ko destê wî de navê wî tucar ji rewşa xwe winda nake, her bi nav û dengtir dibe û her di nav dost û dujminan de xweyrûmet dimîne.

Gurgîn ji her talanî qimaş û qedîfeyên giranbiha û şûrên qevdzêr û kalanzîv, gerdeniyên mirarîkirî, mehfûr û xalîçeyên hevrûşim û keç û jinên rûperî dianî mal.

Rojek ji rojan Gurgîn di şerekî mezin de zora Tirko birî bû. Xelkê Kurdîstanê pê şa bû bûn.

Mîr, axa û serokên eşîran koçer û dêmanî hemî, ji bo serdana wî hatin û di burca bavê wî de heft roj û heft şevan jê e dawet û şahînet danîn. Şeva xelasekê bavê wî ji textê xwe hat xwar li kurê xwe nêrî û jê re got:

— Tu kurekî çak î Gurgîn, Xwedê her arîkarê te be, Xwedê çiqas mezin e; di jîna min de mêrxasîya te nîşa min kir û ez bi çavên xwe ên qerimî dibînim ko navê min û navê malbata min dê bi te her bijî.

Te daye ser bavê xwe ve.

Xwedêyo ez her evdê te me, te kurekî baş, kurekî bi hiş û bîr, kurekî destvekirî da min. Gurgîn, de ji min re bêje, bavê te dixwazî ji te re tişteki bigerîne dîyarî, ka dilê te çi dixwaze? Her çi tiştê ko daxwaza dilê te ye divê jê bigirî.

Dengê bavê wî hê neqedîya bû, çavên Gurgîn wek stêrên ezmanan çirisîn û wî bi dengekî lerizî got:

— Bavê min, mîrê min ê mezin, ji min re keça çiyayên şingarê Perîxanê bide, daxwaza dilê min ev e!!!

Mîr bêhnekê bêdeng ma û xwe ker kir, hawara dilê xwe a bi şewat dibîhîst.

Pişt re bi dengekî xwurt û lez got:

— Wê bistîne, piştî belavbûna dahwetê bila ji te re be!

Gurgîn sor bû, çavên wî ji şahîyê çirisîn, ji cîyê xwe rabû û ji bavê xwe re got:

— Min zanî te ew da min, bavê min fermandarê min ê mezin, ez xulamê te me.

Ez xwîna xwe li ber te de didim, ew xwîn ya te ye, wê dilop, dilop ji canê min bikêşe! Mîr got:

— Ez tiştêkî naxwazim û serê wî ket ser singê wî.

Piştî saetekê dawet firikî û herdu di teniştê hev de bêdeng diçûn bal alîyê malê ve. şev gelek tarî û reş bû. Ewrî qeteke ji ezmanan û rûyê stêran veşartî bû. Bav û kur wisa dimeşyan, naxir Tacîn dest bi gotinê kir û jê re got:

— Roj bi roj jîna min vedimire û dilê min î pîr her roj sisttir dibe û agirê sîngê min her xwe kêm dike, tinê hejkirinê şingarîya xweş bû bû ronî û germîya jîna min, Gurgîn ka ji min re bêje, tu gelek hej jê dikî? Ji carîyên malê bi sedan bistîne tinê bila ew bimîne nîk min.

Gurgîn bi dengêkî tahl bîhna xwe dikişand. Mîr ji nûve got:

— Di dinyayê de çend rojên min mane, tinê çend rojên kurt,.. rojên bi hejmar. şahîya dilê min a pašîn Perîxan bû. Ew min nas dike, hej ji min dike û dikare sebra xwe bi min bîne.

— Ji bilî wê kî dikare ji min, ji vî mirovê pîr û ketî hez bike, tu kes.., kes ji wan..,

Gurgîn bê deng dima.

Çawan ez dikarim jînê de bimînim û ez bizanim ko tu wê himbêz û maç dikî?

Ko xeberdan li ser jinan e, ne bav heye, ne jî kur; Gurgîn!

Êvara jîna min dê ji min re gelek dişwar bibe.

Ji min re xweştir bû, ger birînên min ên kevin vebûyan, xwîna min jê birejîha û min ev şev nedîta.

Kurê wî dîsa bêdeng dima.

Li ber derîyê malê rawestan. Her duwan serê xwe xistin ber xwe de.

Dormedora wan reş bû, bayekî xwurt pencere yên qesrê di hejandin di serbanande, di nav şax û çiqlên daran de, straneke kûvî distra.

Gurgîn bi dengê nerm ji bavê xwe re got:

— Bavê min, ez ji mêj ve jê hezdikim.

Bavê wî lê vegerand û got:

— Belê ez vê dizanim û dizanim jî ko ew hej te nake.

Gurgîn got:

— Kengê ew tê bîra min, dibînim ko dilê min her pê ve girêdayî ye. Methelokên me xweş in, dibêjin jin ji şerî dişwartir e, ko spehî ne dilê bîyanîyan dikeve wan, ko kirêt in dilê mêrên xwe ezêb dibîne. Mîr got:

— Hikmet û gotinên kûr ne dermanên êşa dilan e, kurê wî lê vegerand:

— Ma bavê min, daxwaza me pêşberê hev de girî û gazind e, ma em pê dilnermkirina hev digerin..

Mîr serê xwe ê porspî rakir û bi çavên kovan û keser li kurê xwe nêrî, kurê wî got: Dixwazî em wê bikujin?

— Tu ji min û ji wê zeydetir hej nefsa xwe dikî.

— Tu jî. Dîsan her du bêdeng man, pişt re Mîr got: Belê ez jî!

Mîr ji kul û qehrên vê demê wek zarokekî lê hati bû. Kurê wî ji nû ve pîrskir: Çawan dibêjî... dixwazî em wê bikujin? Bavê wî bi dengê girîn got: Ez nikarim wê bidim te... ji min nayê!! Kurê wî got: Lê ez jî êdî nikarim

bê wê bisekinim, an min bikuje an wê bide min, kurik dîsa jê pîrskir: Dixwazî em wê bavêjin avê?! Dengê bavê wî wek di xewnê de hatê: Bele emê wê bavêjin avê.

Her du ketin aliyê malê, Perîxan ser xalîçeyeke spehî û rengîn raza bû, pêş wê de sekinîn û lê nêrîn. Hêstirên germ ji çavên Mîr diketin ser riha wî a spî û di ser wê de wek mirarîyan dibiriqîn. Kurê wî bi zor û zahmet xwe digirt, bi dengekî zirav bakirê.

Gava Perîxan ji xewê şîyar bû û Mîr dît. Lêvên xwe ên sor da wî û jê re got:

— Eyloyê pîr min maç ke! Mîr dengê xwe nerm kir û bi melûlî got: Ji cihê xwe rabe...divê bi me re bêyî... Kengê Perîxanê ew dîtîni iş çî ye zûka seh kir, ji ber ko zêrek bû, hema got: Ez têm. Qerara we ev e, ne ji bo te ne jî ji bo wî, mêrxas wisan dikin. Her sê bêdeng bal avê ve diçûn. Ser şîvereke asê û xwehrûviç bayî bi dengekî kûvî lib li ber xwe dibir.

Perîxan nazik bû, zûka westîya, lê çawan ew xirayî bû ne dixwest hevalên wê pê bihesine. Gava Gurgîn dît ko Perîxan şûnde dimîne jê re got: Tu ditirsî?

Perîxanê tişteke ne got, bi çavên xwe ên delal mêze wî kir û pêyên xwe î qusayî û bixwîn nîşa wî dan. Gurgîn destên xwe dirêj kirê û got: Ezê te hilgirim! Perîxanê xwe avêt bedena Mîr, zendên xwe li stoyê Eyloyê xwe werandin, Mîr ew hilanî û li ser zendên xwe wek guhekî sivik hilgirt. Perîxanê bi destên xwe çiqlên daran dida alîkî û rûyê xwe jê vedida. Gurgîn ji paş ve dihat ji nişka ve bavê xwe re got: Bihêle ezê bikevim pêşiyê, revîna agirê sor dikeve dilê min, ez ditirsim xencerekê li stoyê te bidim.

Mîr got: Here pêşiyê; bila Xwedê li qusûra te menêre, ji vê gotinê, min tu efu kirî, hevîn çî ye ez dizanim. Êdî guşguşa dengê avê dihat. Gava gihan serê zinarekî mezin, di bin de, di reşiya şevê de, ava şetî wek kortaleke kûr û tarî ji wan re xuya bû.

Bi dengekî tehl pêlên avê; kefdidan û diherikîn. Ev der sar, hov, têtirs û tomet bû.

Mîr Perîxan maç kir û got: Xwedê bi te re be. Gurgîn jî xwe di pêşberê wê de nizm kir û got: Xwedê bi te re be. Perîxanê berê xwe da kortala ko tê de şekên avê strana mirinê distiran. Gava ew ket ber rexê kortalê, laşê wê lerizî û singê xwe bi destê xwe givaşt û got: Min bavêjin!!

Di wextê ko Gurgîn destên xwe dirêj dikir wê û bihna xwe bi kovan dihilkêşa; Mîr Perîxan ber sîngê xwe ve hilanî, givaşt, maç kir û ji serê zinarî avêt avê de. Tu deng û axîn jê sehnekirin.

Ezman reş, ewr hê tarîtir dibû, dengê bayî êdî dengê mirinê bû. Gurgîn ji bavê xwe re got: Bavo de em herin, Mîr hêdî, hêdî digot: Bisekine û bala xwe dida, heçko guhdarîya dengekî dikir, lê tu deng ne dihat. Wextek borî, kurê wî dîsa got: Bavo, de em herin, Mîr lê vegerand:

— Bîhneke din bisekine. Wextekî dî borî, û Mîr got: De were em herin. Çend gavan bi hev re çûn, ji nişka ve Mîr sekinî û got: Ma ez diçim ku?!.. Ma ez ji bo çi diçim?! Jîna min hemû bi wê re bû, ma ko ew çû jiyîn û rihetî ji bo min çi ne, ji çi re ne? Bi kêrî çi tên. Ez pîr im, kes êdî hej min nake û jîna bê hevîn ma ne dînîtî ye? Kurê wî got:

— Bavê min tu bi nav û deng î; di destê te de girtin û berdan û dewlemendî heye.. Mîr got: Gurgîn ji lêva wê, ji lêva Perîxanê, ramûsanekê bide min û dewlemendîya min ji xwe re bive. Ew tiştên ko te jimartin, tiştên mirî û bêcan in, tenê hevîn û jîn rengdar û bihndar in, kanîya jîyanê jin e. Yê ko bêhevîn e, bê jiyîn e, perîşan e û rojên wî bi xem û keser, bi kovan û hêstir in. Bila xwedê her arîkarîya te bike Gurgîn, şev û rojên te bi tenahî û xweşî biborin. Mîr ev xeber gotin û dest çûyina alîyê avê ve kir. Gurgîn qîrek da û got:

— Bavo!! û sekinî, nikarî bû tişteke din bi ser ve zeyde bike, ji zelumê ko jîna wî jê re tahl bûye û mirin pê dikene û wî gazî ba xwe dike, jê re çi tê gotin. Bavê wî lê vegerand: Dev ji min berde. Kurê wî got: Ê Xwedê.

Mîr got: Ew her tiştî dizane û bilez giha serê zinarî û xwe avêt avê. Dengê bayî li nav dar û çiyar xwurt û tîj dihat. Gurgîn berê xwe da ezmanan û gazî kir: Xwedêyo!! Ji min re jî dilekî xwurt bide.

Çavên Mîr Tacîn, di şeva mirinê a tarî de, welê neqihan.

© Nivîskar û Nefel

Nivîskar: KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Weşandin: 2005-06-25

**

Guneh

Carekê min di kitêbekê de xwendibû:

“Serhatiyê meriv çiqas kevnar be, di mejiyê meriv de hewqas şopên kûr dihêle...”

Rast jî wisan e: tiştên ko min di biçûkiya xwe de dîtine, serhatiyê wê gavê îro pir qeç, gelek bi zelaî tîn bîra min.. Lê tiştin hene ko dihî, pêr min dîtine; an bihîstine, an jî hatine serê min bi xwe, îro zû bi zû nayên heşê min...

Qey gava meriv zaro be, mejiyê meriv hêj bêtir nerm û taze ye; ji lewra bîrok û serhatiyê meriv bi hêsanî tê de cîh digrin û her ko zeman derbas dibe şopên kûr dihêlin.. Eve yek ji serhatiyê biçûkî:

Bihar, diqediya. Havînê, nih dest pê dikir. Êdin herkes ji germa rojê direviyan; xwe davêtin bin sîha darekê an dîwarekî...

Piştî xwendineke heş mehan, dibistana me jî deriyê xwe li digirt... Ez, bi xwe pir kêfxweş bûm; heşt meh xwendin, di nav wê girigêç û hay û hûyê de, di nav wan dîwarên teng û tarî de, ne tenê canêmin, rihê, min bi xwe jî bawî bû bû...

Gava mamosteyê me mizgîna belavkirina dibistanê ya havînê da me, ne tenê ez, hemû suxteyên dibistanê mîna çivîkên ji qesefê azad bibin, çirevîtik didan xwe, kumên xwe ber bi ezmanan davêtin û digotin: Her bijî Mamosta! Her bijî Mamosta!... Tenê sê, çar zarokên tiral digiriyan, di sinifa xwe de ma bûn, û li ber mamoste û hevalên xwe rûsar diman: Tirsê dê û bavê wan jî da bû ser dilê wan, bêhemd ji çavê wan hêsir diherikîn. Giyiyê van zarokan hinek kêfa min kêmtir fikir, dilê min bi halê wan dişewitî...

Piştî girtina dibistanê qederek derbas bû bû; rind naê bîra min, Xwedê zane mehan an meh û nîvek. Ez û çend hevalê xwe ji ser zinarekî derbasî ser latekê dibûn, kaş bi kaş, newal bi newal li hêlîna çûkan digeriyan; bi saetan ve bi dû çêlikê wan ên nihfirî diketin; me ew digirtin, ew heuwanê bê zar û ziman heta di nav pepikê me de bimiran, me bi wan dilîstin...

Em, carina serqot, carina jî pêxwas digeriyan û ji vî halê xwe bêtir şa dibûn. Kum û sol û cilê me ji me re teng dihatin, bi her hawayî me dixwest em serberst bin...

Çiqas car histiriyê kaşan lingên me diqelaşt, û kelemên wan dar û deviyên lingê me xwin dikirin. Dîsa ne xema me bû. Haya me ji me tune bû; lîsk, serbestî, azadî em semest û serxweş dikirin... Çend caran me ji dê û bavê xwe gotinên tahl dibêhîstin, dîsa me guh nedida wan...

Piştî heşt meh zwendin û ew jiyana zindanî, sê çar mehê havînê serbestî para me bû heqê kesî tune bû me ji vî azadiyê bê par bike.

Rojekê min û sê çar hevalan me gotina xwe kirin yek: emê biçûna Şikefta Bilxêrê, nêçira çêlkewan... Şikeft sê çar saetan ji gundê me dûr bû. Ji ber germa havînê kewan teva çêlikên xwe, xwe davêtin bi sîha vî şikeftê. Di şikeftê de kaniyek jî hebû. Lê şikef ne xalî bû; çihê pîebok, cin û periyan bû. Heta min ji pîrika xwe carekê bîhîst ko Şikefta Bilxêrê paytextê

padîşahê cin û periyar e, kes ne wêrî bû here hundirê vê şikedtê. Heta peyayên mezin bi xwe jî taqet ne dikirin. Lê zarotî. Ji bona nêçira çêlkewan, ne cin li bert çavê me xuya bûn ne perî... Ji xwe me dixwest cara ewilê em vî mêranîyê nîşan bidin; di şikefta cin û periyar de nêçira çêlkewan bikin.

Reşo û Remo li ber derç man, ez û Cemo jî ketin hundirê şikeftê; ha li vir, ha li wir me sê çar çêlkew girtin. Ew pir biçûk bûn, nikarî bifiriyar. Di wê gavê de dinya bi qenc û xezînê xwe ve bidana me, em hewqas kêfxweş û dilgeş ne dibûn. Lê em hebekî westiyar; li ber derê şikeftê darek tûê habû, em li bin sîha wê rûniştin, me him xwe rehet fikir, him jî him jî em bi nêçirên xwe şa dibûn... Hingî Cemo tî bû bû; dixwest here hundirê şikeftê avê vexwe, lê bi tenê ne wêrî bû. Min dizanû bû li xwe danîne ji kesî re bibêje: bi min re were hundirê şikeftê, ez ne wêrim bi tenê, ez ne wêrim bi tenê herim. Min, bêguman dizanî bû ewê bi tenê here... Di wê gavê de şeytaniyek hate bîra min. Min xwe ji wan vedizî û ketim hundirê şikeftê. Ne Cemo û ne jî tu hevalan çûyina min a şikeftê ne dîtin. Min di quncikekê de xwe veşart. Min dît Cemo hêdî hêdî, bi tirs lingê xwe davêje û tê. Şikeft tarî bû, hêj av venexwari bû, gava nêzîkî min bû, ji nişka ve, bi dengê bilind min go: pix...! Pix!

Heyhat!... Cemo, di dilê xwe de got qet cin e, bi tirseke mezin veciniqî û ket erdê; dev û diranê wî ketin hev. Çiqas min deng li kir qet li min venegerand. Bi tenê çend caran çavê xwe vekir û bi tirs li min nêrî. Çavê wî ê kesk di nav tariya şikeftê demîna du cincîqan diçirisîn... Hingê min fam kir ko min qebehetea, an hêj bêtir, gunehê mezin kir. Ez çûm cem hevalan û min ji wan re got: werin bê çî li Cemo hatiye?

Em her sê çûn cem wî, çiqas me kir ne kir me nikarî bû ew ji cihê wî bilivanda. Ji xwe em giş zarok bûn, em her sê çar jî, heft heşt salî bûn... Hingê dengê bilûrekê ji dûra vehezî hezî dihat. Me dizanî bû xwediyê

vê bilûrê şivanek e. Reşo û Remo li ber Cemo man, min xwe li dengê bilûrê girt. Piştî qederekê min xwe gîhand şivên û min serhetiya me ji wê re got. Şivan. Ji dûr ve, merivê Cemo dihat; pezê xwe sipart hevlekî xwe û bi min re hat şikeftê; Cemo li piştta xwe kir û em bi hev re vejeriyan gund. Hij zimanê Cemo ne digeriya, min jî ji fediyar, qebeheta xwe vedişart, heta min ji hevalê xwe re jî rastî ne digot.

Em çawan vedigeriyan gund? Dê û bavê Cemo ewê ji me re çi bigotina. Me ê ji dê û bavê xwe re bigota çi? Çar ne çar em diçûn.

Çîroka me zû li nav gund belav bû. Bavê min, di mal de ez heps kirim. Min bîhîst ko hevalên min jî mîna min heps kirine. Hêj jî zimanê Cemo venebû bû. Her kesî digot: Ciniyê wî şeytanî ye, ne rehmanî ye û gişan, ji dawiya Cemo ditirsiyan, tenê Şêx Sedeqe...

Şûx Sedeqe, bi cin û periyan dizanî bû. Ev kalê rîsipî ko zeman piştta wî xwar kiri bû, bi nav û deng bû... Eslê wî ya ji Mekê bû ya ji Medînê... Min bîhîst ko şêx, ji bavê Cemo re gotiye. "Heke tu deh zêran (pênc pêşin, pênc paşin) bidî min ezê kurê te rehet bikim..." Bavê Cemo jî qayil bû bû û goti bû "Tu kurê min rehet bike mal û milkê min giş ji te re pêşkêş in..." Êdîn her kesî hêvî dikir ko şêx ewê Cemo rehet bike... Tenê min bawer ne dikir. Min derd û êşa Cemo ji Şêx bêtir ş çêtr zanê bû...

Gava Cemo birin cen şêx, şêx ez jî xwestim nik xwe, û ji min çend pirs kirin: "Wexta ko Cemo çû şikeftê, cihê ko keti bû xwar, û çiqas nêzîkî qoziya çepê bû, çiqas nêzîkî qoziya rsatê bû??" û bi kêtêba xwe dinêrî û bi qelema xwe a qîjotî li ser kaxetekê çend xêz û nixtik çêdikir ş serê xwe dihejand û digot: "Min fam kir... Min nas kir kîjan cin e... ev cinekî şeytanî ye, jî re dibêjin: polotox..."

Paşê li ser neynûkên dest û lingê Cemo bi qelema xwe tiştin nivîsand û got "Min cin di laşê wî de heps kir, heta ez wî ne kujim, bera nadin, ka ji min re destek şivê ter bînin".

Xulamê wî Dilo, gurzek şivê hinarê jê re anîn û bi lingê Cemo girt û bilind kir, şêxê wî jî, şiv bi şiv di lingê wî zarokê reban dişkand... Cemoyê ko heta wê gavê zimanê wî ne digeriya qîrîna wî diçû ezmanan. Lê şêx digot “ev ne dengê Cemo ye, hêj zinanê wî girêdayî ye û dest bi lêxistina xwe dikir û digot: Efrît... şeytan... ma tu tu ji destê min bi kû de birevî” û bi zimanê cinan çend pirs li ser dikirin: têmatim... tenatin... şin... şin...

Xwîn ji bin lingê reben diherikî, gava her darek li bin lingê reben diket, tîrên birûskê li dilê min dixist... Min nikarî bû rastî bigota. Ew roj ne bû êvar., Cemoyê reben ji ber darên wî zalimê xedar mir.

Ev bû bîst, bîst û çend sal... ev çîrok li serê min qewimiye. Hêj ji bîra min ne çû ye. Ji min re bûye derdek, di hundirê min de bûye girêkek, di dilê min de bûye birînek... birîneke pir kûr. Sal bi sal nêma û kêma wê bêtir, êşa wê zêdetir dibe. Giyanê min ji ber diheje... Gelek caran, Cemo di xewna xwe de dibînim; li hember min melûl melûl disekine û bi gilî û gazin ji min re dibêje, bêbext... bêbext!

A-Zîwan: 28-1-942

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: QEDRÎ CAN

Weşandin: 2005-06-25

Xwendin: 10475

**

Were dotmam

Ji Haco axa re

[ŞAM, 1935] — Dotmam welê ye, heta mirov xwe nas dikit mirov emrê xwe xelas dikit.

Ez pîr bûme. Di derxika canê min de çil Buhar bişkivîne. Qurma bedena min çil Zivistan dîtine. Bi sedan ba û bahosan ew hejandine, bê hejmar berf û baran tê re çûne.

Herwekî dibêjin ciwanî bizaniya pîrî bikariya. Lê pesn ji Xwedê re ko hêj ewçend ne pîr im ko nikarim.

Wekê ez jî ciwan bûm, simbêl hêj nû avêti bûn ser lêvên min, dilê min bi hevîniya delalan hildavêt, hon ne yek, ne dudo, ne deh, ne bîst bûn. Kej û gewr, esmer û genimî, bejn bilind û navîn, kinên we jî hebûn.

Hon hemî ji min, ji me re bûn. Me kîjan bixwesta, ne ewê, ne mamên me, ne digotin no. Lê min, me hemîyan nizanî bûn. Çavên me bi we, bi bedewîya can û giyanê we ne diket.

Me dev ji we berda bûn. Yekî biyanî dihat, hon dixwestin. Me ji xwe re ne fikir namûs. Hon dibirin. Hon bêqedr dikirin. Di rêzika dinyayê de hon tayih dibûn. Ev ne sûcê we, lê yê me bû.

Hon di gulistana mala me de gul û bişkojin bûn. Baxvan û dîdevanên we em bûn. Bihna we a xweş, rengê we ê geş û birewş tu dibêjî qey ne ji me re bûn. Em pê ne dihesiyan. Me ew ne didîtin.

Yek dihat, destê xwe drêjî we fikir, hon diçinîn, dibirin. Pêde welê bû. Hon, gulên gulistana me dihatin çinîn, me guh ne dida, em pê bendewar ne dibûn.

Rojekê, me hew dît, gulistan bê gul, daristan bê bilbil maye.

Em di himbêza jinên biyanî, hon di bin çengê mêrên nenas de.

Bi vî awayî me xwerûtîya tovê mala xwe, tovrindîya malbata Azîzan winda fikir.

We zaro dianîn, li me, li xwalên xwe dihatin. Merd, cwanmêr, xweyrûmet. Ji bavên xwe re namûs dikirin.

Zarowên me li xwalên xwe dihatin. Xwalên wan kurên kê? Ji kîjan ra û nijadî? Ji kîjan mal û malbatê?

Wan navên me hildigirtin. Yê ne ko ji zikê mala me derdiketin li ser dra bavê xwe şîn dibûn.

Herê dotmam, keçmama çeleng, tu çûyî, hon çûn. Em di destê jinên biyanî de, hon di bin rikanê mêrên nenas de.

Zarowên we xwarzîyên me ne. Lê ne xwarzinen adetî. Li şer xwal û xwarzî. Lê ne xwarzîyên me. Ji ber ko ne ji nijadê me ne, xerîbî wî nijadî ne. Carin hene, neyarên wî nijadê pak in jî.

Belê li şer xwal û xwarzî. Xwal û xwarzî li rex hev, berê wan li armancekê şer dikin. Xwarzîyên me li me radibin. Berê wan li berê me ye. Em armanca wan, ew armancên me ne. Heçko em ji hev re polik in. Bi destên hev, di destên hev de dimirin.

Dotmama delal, ma ne heyf e, xwîna zikê te bi xencera min bête rêtin. Ma ne mixabin e, kekên te bi berikên berê zikê te bikevin...

No! no! dotmam, heyranîya pismam, êdî bes e, hew bibe jina xelkê, bes bibe dêya nekurdnijad, vegere were himbêza pismamê xwe, paxila kurmamê xwe.

»Vegere« ev ne gotinek rast e. Em nikarin ji te re bibêjin »vegere«. Ji ber ko tu ne çûyî, me tu rêkirî. Me bi destên xwe tu hinartî mala xelkê.

Himbêza xwe veke ez ji te re têm. Min himbêz bike. Min wek mêr, pismam û her tiştê xwe maço bike.

Dotmam, min ji te re got ez pîr bûme. Lê pîrîyê ez hişyar kirim.

Buhar ciwanî ye, Zivistan pîrî. Zivistan piştî buharê têt. Di Zivistanê de Buharinen veşartî hene.

Herê dotmam were, xwe berde himbêza pismamê xwe. Ezê ji te re, ji Zivistana xwe a sar Buhareke germ çêkim.

Were dotmam, heyranîya pismam were, xwe di germîya dilê min ê ciwan û ciwanîya min a kevn de bigermîne.

Were dotmam were, ez stûna heyîna te a stiwar im, tu jî bibe rewşa jiyîna min a Rewşen.

Bedir-Xan, Celadet Alî, (1935), »Hawar«, »Were dotmam«, hjm. 26

Nivîskar: CELADET ALÎ BEDIR-XAN

Weşandin: 1997-05-31

Xwendin: 12090

**

Rêwîtiyeke efsûnî

Ji riya rast dageriyan. Ketin kuçeyê. Ew dudilî bû. Jê hez nedikir. Diviyabû biçûya karê xwe. Ji bo vî karî ji cihekî pir dûr hatibû. Şeş sed û pêncî kîlometre rê birîbû.

Lê (Wî) nehişt. Wek şeytanekî ew ji rê derxistibû. Ew bi xwe bi kelecana bû û dixwest wî jî bi kelecana bike. Berî ko ew bigihîjin serê kuçê, her ko gavek davêtin di serê xwe de dibir û tanî. Halan tê dida û ew dihejand. Gava ew gihîştin, êdî nerm bûbû. Ne bi dilê xwe digel wî kete kuçê. (Ew) ji nişka ve şa bû. Got:

— Ez ê rêwîtiyeke efsûnî bi te bikim.

Wî deng nekir û da dû. Wek hatibû kedîkirin û gav bi gav dida dû wî. Digel wî diket rêwîtiyeke efsûnî...

Riyeke bi kortal û xwaro maro ko ber bi jêr ve dirêj dibû. Riyeke weha bû ko gava te gava xwe diavêt diviyabû çavekî te berdewam li jêr ba, da ko tu nehilkumî an jî tu nekevî kortalekê. Diviyabû çavê te yê din jî li jor ba, ne ko tu li dîwarekî biqelibî û di deriyekî re bikevî jêr. Hem kortal e hem kuçe ye... Ji bo wî ev ne kortal bû, kolan bû. Pêwîstiya wî pê tunebû ko çavekî wî li jêr yek jî li jor be. Ji ber ko bi çavên xwe yê hundirîn didît û zanîbû ko pêwîstî pê nîne...

[...Ez ê piştî şeş heft gavan bi ser destê çepê de bizîvirim... Kolan bi xwe min dizîvirîne. Digihîjim hemberî wî. Ez teneka çopê ya li ber derî tînim. Ez bernixûm dikim û diçim ser. Ez destê xwe ji qulikê dirêjî hundir dikim û ristikê dikişînim. Derî vedikim û dikevim hundir. Emînê li hundir li ber mûslixê ye. Firaxan dişo. Gava çav li min dikeve bi min re dikene. Dibêje:
— Eferim... a weha... Ma çima ez ê her car ji te re derî vekim.

Berê her cara ko ez diçûm min li derî dixist û Emînê ji min re derî vedikir. Carekê heta qirikê hatibû dagirtin. Got:

— Oof, ma destê te bi xwe şikiya ye ko tu bi xwe derî venakî?

Gava min bi wê şermê jê re got:

— Axir destê min nagihîje ristika derî.

Wê teneka tozê bernixûm kir. Ji min re danî û got:

— Here ser.

Vêca derî girt û got:

— Destê xwe dirêj bike.

Min destê xwe dirêj kir û derî vekir. Jê pê ve piştî ko ez diçûm min nema li derî dida. Lê niha divê ez li derî bidim...]

(Wî) ew şiyar kir û jê pirsî:

— Tu çi dikî?

Te digot qey ew teyšî xewê bû û bersiv dida. Got:

— Ez li derî didim.

Yê din emir lê kir û got:

— Meke... Bide pêşiya min, em herin.

Bi ya (Wî) kir. Ket pêşiya wî û çûn.

[... Mala hoste Heme Kerîm... Mala mam Qadir... Mala Sale Sineyî... Pêrar bû ko min kurê wî Heme Emîn li Bexdayê dît. Min ew nas nekir. Lê wî dest pê kir û got:

— Şiklê te ji min re ne xerîb e, mîna ko ez te nas dikim.

Min baş bala xwe dayê û mêjiyê xwe guvaşt. Bê sûd bû. Min got:

— Bibexşîne, cenabê te kê ye?

Bersiva min ew xist gumanan. Tu nemabû dev jê berda. Min got:

— Tu ya rastî dixwazî ez di naskirina insanan de bîrkorî me. Loma meke.

Hingî wî got:

— Ez Heme Emînê kurê Sale Sineyî me. Heke ez ne şaş bim em zarokên eynî taxê ne. Çi bigire em zarokên eynî kuçe û kolanê ne.

Heme Emîn... Mam Salih... Feyme Xana jina wî... Sebawa keça wî... Diya min çû xwazgîniya Seba ji bo kekê min. Diya wê gotibû bavê wê ew ji pismamekî wê re hiştiye. Dû re ji cîranan re gotibû em keça xwe nadin kesekî ko ji birçîna dimire. Ji ber wê yekê navbera diya min û diya wê û navbera bavê min û bavê wê xerab bû. Heta ko me ji wê taxê bar kir jî em bi hev re nepeyvîn.

Gava em li ser daxwaza wî çûn û rûniştin û min ev behs anî bîra wî, wî jî bi min re dest pê kir, bi hîke hîk keniya û got:

— Baş tê bîra min. Diya min jî ez her tim tehdît dikirim û nedixwest ez bi te re bipeyivim. Min digot baş e, bi rastî jî min digot ez bi te re napeyivim, lê gava em diketin nav lîstik û bazdanê min soza xwe ji bîr dikir.

Bi dirêjiya rûniştina me sohbeta me her li ser taxê bû. Gava min nûçeyên taxê yên dawî jê pirsî, derket ko ew ji min pir zêdetir nizane. Got:

— Ev huvdeh sal in ko ez jî hem ji taxê, hem jî ji bajêr qut bûme. Ez carina di nav re gava bi tesadufî pêrgî yekî wek te tîm ez nûçeyên taxê jê dipirsim.

Gava min jê pirsî:

— Ma di hundirê van huvdeh salan de qet riya te bi wir neketiye?

Got:

— Na, bedaxewe!

Min got:

— Tu çî dibêjî ko em herdu bi hev re sefereke taybetî bikin û herin seredana wir... Em bi hev re li kuçe û kolanên wê baz bidin û li xirbeyê ber mala Xumsar têra xwe, xwe vegevîzînin.

Wek ko em behsa tiştêkî pir girîng dikin û li ser li hev tî destê xwe dirêj kir û got:

— Ka destê xwe bide min... Welleh ez ê bêm û mîna tu dibêjî bikim.

Min destê xwe da wî. Me soz da hev. Em vegeyriyan hotêlê û em razan. Lê gava em sibehê şiyar bûn kes ji me li ser vê meseleyê nepeyivî. Her yek ji me çû karê xwe. Gava me nîvro dîsa hevdu dît, ew behsa ha dîsa nehat holê. Heta li der û dora esir ko ew bang kirin ser telefonê. Gava vegeyriya, got:

— Divê ez herim.

Bi lez çentê xwe amade kir û çû. Min jî êdî ew behsa ha ji bîra kir. Heta vê sibehê ko şeytan ez xapandim û ez lê germ kirim û got:

— Bi salan e ko tu li benda firsendeke weha yî. Tu pêrar digel Heme Emîn li hev hatin ko sefereke taybetî bo çûna wir bikin. Niha va ye ew firsend bi hêsanî ji te re peyda bûye. Ji destê xwe dermexe.

Min çiqasî li ber xwe da û got:

— Axir ez ji bo karekî din hatime.

(Wî) dev ji min berneda û got:

— Tu digihîjî ko karê xwe jî bikî. Firsendeke û ketiye destê te. Ji destê xwe dermexe. Here û li nav kolanên taxê bide lotikan. Yek bi yek li deriyên malan bide. Bêtirs têkeve hundir û derkeve. Dawiya dawî here xwe li nav xirbeyê ber mala Xumsar vegevîzîne. Firsendek ketiye destê te û ji destê xwe bermede.

Wê gavê zarokek ji deriyê mala Sale Sîneyî derketibû derve. Demek bû rawestiyabû û li wî dinerî. Gava jê haydar bû, dikir ko devê xwe veke û jê bipirse. (Wî) bi lez ew hişyar kir û jê re got:

— Bibêje ez li mala Hecî Mehmûdê Elaf digirim.

Ev gotin ne niyeta wî bû. Lê bi gotina (Wî) kir. (Wî) çi emir kir û wî jî weha got. Zarok got:

— Kesî bi vî navî li vê kolanê tune.

Ew di hundirê xwe de ser û bin bûbû. Spasî zarok kir û bi riya xwe de çû. (Wî) ji wî lome kir û got:

— Heke weha here tu ê teşqeleyekê bînî serê me.

Wî got:

— Yê ko teşqele aniye serê min tu yî. Min got ez nayê, lê te bi zorê ez kêşam.

(Wî) pê re dirêj nekir. Zanîbû ko rast dibêje. Da dû wî û meşyan...

[...Tu dibêjî qey di hundirê tunelekê de ye. Berê ne weha bû. Ez hezar carî tê re hatime û çûme... Her wek xwe ye. Tu dibêjî qey kesî destê xwe nedayê. Ew ode di ser mala Semed Axa re bû. Tenê tiştê hatiye guhertin, berê wek çira şîr bû, lê niha boz bûbû. Rojên avakirina wê baş tê bîra min. Odeyeke rêk û pêk û spî û wek çira şîr û bi pencere bû. Baş jî tê bîra min ko min ji bavê xwe re got:

— Bavo... Çima tu jî odeyeke weha spî û pak ji me re li ser ban ava nakî? Bavê min wek bersiv destê xwe bi sozdarî di ser serê min re bir belkî ez niha bikaribim maneya wê şirove bikim. Heke na wê kêliyê ez pê dilteng bûm. Gava min pirs dubare ji diya xwe re got, wê destê xwe jî di ser serê min re nebî. Êdî her bi temamî ez xemgîn bûm û her cara ko digiham rasta wê, pirs di serê min de vedijîya. Erê bi rastî ji bo çi? Gelo min hesûdî ji wan fikir?.. Ma min jî dixwest ez wek wan bim? Gelo ji ber ko dil û hundirê min gemarî bûn? Na, na bi Xwedê, ez qet ne yekî welê bûm. Ne bi zarokî û ne jî niha bi mezinî.

Na, na Welleh, ez xwe nas dikim. Lê odeyeke rêk û pêk, xweşik û spî wek çira şîr spî bû. Ez hogirî bûbûm û min dixwest ko odeyeke me jî ya weha

heba. Aha binere, niha jî çiqasî xweşik e. Bi tenê rengê wê hebekî boz bûye. Heke na...]

Tu çi dikî?

Ha... heke na...

Ew rawestiya bû, û ji jêr ve li odayî hildinerî. Û çavên wî li ser nixteyekê sekinîbû. Awirên xwe dagerand û li jêr nerî. Bi aliyê destê çepê ve çerx bû. Dîwarekî xwar û maro û bilind ber bi jor ve hilkişiyabû. Heta serê kuçê diçû û bi aliyê çepê ve dizîvirî. Odeya jor ya wî alî û dîwarê xwar û bilind yê vî alî şiklê deriyekî tunelê dida kolanê.

Çûn. Çûn aliyê din. Lingên xwe avêtin nav sînor. Sînorê hundirê xirbe.

Kes ne xwedî ye û her kes xwedî ye...

...Hîn wek xwe ye. Meydaneke fireh û çar serkolan in. Hingî pênc bûn. Haya min jê heye ko ya pêncem çawa vemirî... Çawa hat girtin. Çûn û hatina min ya wê kolanê ne kêmtir ji ya vê kolanê bû. Wê derê em rast derdixistin ser riya teze. Vêca ji wir jî em derdiketin nav baxçe û Weys. Her wek şerê me yê taxê, me ew wek deriyê sereke yê kelehê bi kar dianî. Derî ji qelîşteken navbera du dîwaran pêk hatibû. Ew navbir ne zêdeyê metreyekê bû. Aliyek derdiket ser rê û aliyê din cihekî sê qorzî û vala bû, û jê pê ve meydan bû. Yekem car dîwarekî ji kelpîçan di navbera herdu dîwaran de çêkirin. Piştî wê riya çûn û hatinê hat birîn. Piştî demekê ew cihê sêqorzî jî girtin. Dîwarekî bilind bi ser meydanê ve lêkirin. Ez pir li ber ketim. Min ji Heme Ceza pirsî:

— Çima welê kirin?

Wî jî tişteke jê nedizanî. Bi tenê milê xwe hejand û tişteke negot.

Kolanên din wek xwe û berê ne. Ew ê li hemberî min riya çûn û hatina xwendegehê bû. Kolana din ko ji aliyê meydanê yê din digihîjê vê kolanê riya çûn û hatina min a hundirê bajêr bû. Ez ji wir digihîştim ber aşê gûyîn, nav meydana mastfiroşan, ser meydana kafiroşan, kuçeya xumxaneyan,

seracan, firaxsipiyan, ba hawizê bazarê û qeyseriya Osman Paşa. Heta ez kurê diya xwe bûm ez di wê kolanê de ji Hemama Sûret dûrtir nediçûm. Lê piştî ko ez bûm kurê bavê xwe, bi aliyê Hemama Sûret ve hildikişiyam ber bi meydana kafirosan û heta Esheba Spî diçûm. Ê bi aliyê aşê gûyîn heta ber deriyê serayê diçûm. Lê ew ê li aliyê destê çepê tenê kolana bazdana min a rojane bû. Di şiklê kevanekê de ye. Ev serî li serê meydanê ye û serê din digihîje kolana ko tê nav meydanê.

Hemû wek xwe ne. Tiştê jê nehatiye guhertin. Ev e, ez dibînim. Ev e ez kevnemeydana rimbaziya xwe jî dibînim. Lê çima welê vikî vala ye. Çima welê bêdeng û his e? Ha... tu çi dibêjî:

— Dibêjim ew li xwendegehê ne. Li saeta xwe binere. Niha saet neh û nîvê sibehê ye.

Na xêr, ez li saeta xwe nanerim. Niha dem li der û dora esir e. Meydan bi dev re ye. Hemû bi kelecana in. Em û lîstika xaran. Ez yê yekem im-tu yê herî dawî yî-duwem-tûş bike. Lê nakeve. Fen-Qilûçank?-Ez nakim-Meke-Lîstika kevir-fîkanko-Ez bi xwe yekem-Te fen kir-Ez nakim-Cehenema te-Çalçalên-Bi gwîzan?-Na bi mişmişan-Şêrîn?-Şêrîn-Pênc bi gwîzekê- Na bi heftan-Baş e-Tu-Na tu-Nakim-Ha ji te re mişmişên te û ka gwîzên min-Ez nadim-Şer-Xeyd-Çerxûfelek-Meta Xumsar-Pehînek li jûniya Ehe Kele da, Ehe Kele di cihê xwe de melisî. Agir bi kezeba diya Ehe ket. Hat şerê meta Xumsar bike. Diya min pêşiya wê birî û nehişt biçe meydana şer. Diya min digel jinên din ew birin malê. Kekê min jî destê xwe xist bin milê Ehe, û digel Heme Selîm û du-sêkên din bi hejandin çûn hundir. Meta Xumsar vejeriya ser çerxûfeleka xwe. Em jî ber bi lîstikên xwe ve vejeriyan. Ez dibînim ko kekê min derketiye derve. Li ber derî rawestiyaye. Bang min dike û dibêje were. Dibêje bes e, were xwarina xwe bixwe. Divê ez bi a wî bikim. Rast e, ez birçî me. Ez ê herim.

Niyeta te çi ye?

Ez diçim... Ez ê herim xwarinê bixwim û werim derve.

Çûyina çî, xwarina çî! Bila hişê te li serê te be...]

Rawestiya. Sê-çar gav mabûn ko bigihiştayê. Bi lez li der û dora xwe nerî.

Kes nedî. Li ber xwe nerî. Awirên wî li derî asê ma...

[...Ev jî her weke xwe ye. Lê ji berê bêtir reben û kincperîtî xuya bû. Ew di dema xwe de ne ewçend jihevdeketî bû. Hê ewqasî neketibû û reng neavêtibû. Gelo aliyê wî ê din çawa ye? Ez tu guhertinan tê de nabînim.

Ax!... Hewşeke biçûk û xwaro maro. Ber bi destê çepê ve hêwanek heye.

Hêwan bi ser hêwanê ve ye û odekek biçûk li ser e. Li bin wê odekê gencîneyek heye. Li hemberî hêwanê hêwaneke din a bervekirî heye.

Sertenûr e... Mitfax e... Hemam e... Avdestxane ye, bêî ko tu dîwar di navbera wan de hebe, bi tenê avdestxane ko aliyekî wê bi telîsan ve hatiye girtin. Dem dema esir e. Ez ji xwendina dibistanê ya danê êvarê vegeriyame. Ez bi lez im. Ez pir bi lez dadigerim hundir û zû dikevim odê.

Ez kitêbên xwe datînim hundirê taqa xwe û bi lez derdikevim derve. Diya min bi min digire. Ez bi naçarî teslîmî wê dibim. Ew min dibe aliyê tenûrê.

Wê rojê nan lêxistibûn. Hê bizot di tenûrê de hebûn. Ez kincên xwe yek bi yek ji xwe dikim. Diya min kincên min yek bi yek bi ser tenûrê de dadiweşîne. Çend qirçîn tîn guhên min. Kêfa min pê tê. Ji ber ko ez ê dotira rojê bixwebawer biçim dibistanê. Tirsra Şêrwan di dilê min de namîne. Heta mirinê ji bîra min naçe. Haya min qet ji tiştêkî tunebû. Min bêdeng û ji dil û hinav guhdariya mamoste dikir. Ew ji nişka ve qîriya:

— Ay mamosta, aha spîyek!

— Ay mamosta, aha spîyek!

Gava ez bi ser hişê xwe ve hatim, min dît ko tiliya xwe ber bi stukura min ve dirêj kiriye. Min dixwest ez di wê navê de bibim dilopek av û bi axê de herim xwarê. Lê mamosta Şêx Evdila, heta mirinê wê jî ji bîr nakim, pir bi hêdî hat aliyê min. Ez pê hesiyam ko Şêrwan da aliyekî û xwe bi ser min ve tewand. Min his ko bi du tiliyên xwe yên destê rastê rahişt spîyê. Di

eynî wextê de, gava xwe rast kir, destê xwe yê çepê danî ser milê min û ji Şêrwan re got:

— Kurê min, ew pêşî bû, ne spî bû.

Herçiqas min berê jî ji mamosta Şêx Evdila pir hez dikir û di nav hemû mamostayan de li ba min yê herî bi qîmet bû, lê ji wê rojê û pê ve ew li ba min bû mirovekî pîroz. Loma gava rojekê ji nişka ve ew winda bû û min bihîst ko ew hatiye girtin û xistine girtîgehê, ez bi dizî çûm hewşa dibistanê, cihekî talde û ji dil ji bo wî giriyam. Lê xwezî...

Agahdar be... Ev kesê sisiyan e ko di ber te re dibuhure û bi ecêbmayîn li te dinere. Tevbigere.

Ew hîn li ber derî wek pûtekî bû. Gava li xwe hayê bû, devê wî ji hev ma. Li der û dora xwe nerî. Rêwiyek çend gavan jê bi dûr ketibû, her diçû û li dû xwe dizîvirî û li wî dinerî. Di eynî demê de dît ko jinek jî hatiye ber derî û bi ecêbmayî li wî dinere. Xwe li nezaniyê danî. Hêdîka bi aliyê çepê de zîvirî û meşiya. Derî û meydan li dû xwe hiştin. Devê kolaneke pehn ew digirt hundir, devê wê kolanê ew ber bi bajêr ve dibir. Piştî sê-çar gavan wî jê re got:

— Jin çû ket mala we.

Vî got:

— Ez dizanim...

[... Dikeve hundir. Dibîne ko diya min li ba xwişka min Leyla pir bi belengazî rûniştiye. Leyla mîna darikekî ji hev rakişiyaye. Bi dengê nizim dinale. Ew zû ji diya min dipirse:

— Leyla çawa ye?

Diya min kelogirî bersivê dide:

— Ev e, tu dibînî.

Ez eynî demê ji dibistanê ve geriyame. Ez li hundir im û min kitêbên xwe xistine taqê. Ez li ser derketinê bûm. Piştî wan gotinan dengê giriyê diya

min ê dilperitîn tê min. Ez his dikim ko giriyê diya min girî dixê qirika min jî. Ez zanim ko ev meh û nîveke Leylê ye ko di nav nivînan de ye. Lê ev cara yekê ye ko ez dengê giriya diya xwe ya li ser wê dibihîzim. Ez ji hundir derdikevim. Ez li hêwanê radiwestim. Dibînim ko diya min serê xwe xistiye nav jûniyên xwe û di ber xwe de dinuhurîne. Ez li meta Xeyrê jî dinerim. Hêsir ji çavên wê tîn xwarê. Ez li Leylê dinerim û bala xwe didim rûyê wê. Ez li çavên wê dinerim, ez his dikim û wek girêkek ketibe qirika min. Ez his dikim ko bi carekê ve bigirîm. Ez ji nişka ve vediciniqim û baz didim derve. Gava ez derdikevim, ez li refek jin ras tîm. Ew dikevin hundir û ez xwe digihînim cihê lîstika êvaran. Gava ez vedigerim malê ez qerebalixiyekê dibînim. Ez nizanim mesele çi ye. Tenê ez ewqasî tê digihêm ko diya min bêtir digirî û hawîrdora wê tije jin in. Ez dibînim ko bavê min jî aciz û bêdeng e. Sê-çar zilam lê kom bûne û bêdeng rûniştine. Kekê min xwe xistiye quncikekê û bêdeng û aciz rûniştiye. Xuşka min a biçûk wek haya wê ji tiştê tunebe ji xwe re di hundirê malê de diçe û tê. Ez nizanim çi bikim. Bêtevger dimînim. Ez li cihekî li hewşê rûdinim û xwe melûl dikim. Ji nişka ve dengê qîjîna diya min tê min û dû re hawar û gaziya jinan tê min. Vêca ez dibînim ko bavê min, ew zilamên li ba wî û kekê min radibin ser xwe. Bi tîkçûyin vir de û wê de diçin. Xuşka min a biçûk hê jî bê ser û ber di hundir de diçe û tê, lê niha ew ji dil digirî. Bavê min û kekê min jî her yek destmalek di destê wan de ye û bêdeng digirî. Lê dengê giriyê min guhan ker dike. Hundirê hewşê pir qerebalix bûye. Ez dibînim ko Xuşka Ecê bi destê xuşka min a biçûk girtiye û ber bi min ve tê. Ew bi xwe jî digirî. Gava tê rasta min bi destê min jî digire û me herduwan dibe derve. Ew me dibe mala xwe û me dispêra keça xwe Nezîre. Nezîre jî digiriya. Ew destexuşka Leylê ye...

Ew jina ha digel pîrejinekê û xortekî hatine ber derî û hûr hûr li te dinerin.
]

(Wî) ev agahdarî da wî. Lê vî bi tenê awirek dayê û qet bersivek neda.

[...Bi şevan, gava Leylê diçû ba Nezîre ez jî bi xwe re dibirim. Ew bi çêkirina kumên xwe ve mijûl bûn, ez jî digel Heme Ceza heta ko dersa me hebû me dersa xwe çêdikir, piştî ko bavê wî vedigeriya, ez, Leylê, Nezîre û diya wan, em ji bo guhdarîkirina dûmahiya hikayeta şeva berê, an jî ji bo beşa yekê ji hikayeteke nû, rûdiniştin û me lê guhdarî dikir.

Xalê Mecîd!... Bi demê re ez şikil û dîmenê kê jî ji bîr bikim lê ê wî her di bîra min de ye. Mîna ko du birûyên gur û reş bi eniya wî ve hatibe zeliqandin. Du çavên mezin û beloq di bin wan de bûn. Çar qermîçokên stûr li jora wan. Du lêvên dagirtî û çeneyek pehn. Mîna ko bêvileke lihevhatî di nav du gepên gulmitî de hatibe zeliqandin. Ev hemû tişt di nav seriyekî bi pirç de cih digirtin. Û serî bi ser stûyekî kurt ve ragirtiye. Û mîna ko stû jî di nav du milên pehn de hatibe kutan. Belê, wî dîmenî saw dixist dilê mirov... Dîmenê mêrkujekî pir dilhişk û mêrxas bû. Belê, yê ko ew ji nêzîk ve nas nekira û yekem car ew bidîta, wê bê dudilî weha têbigihîşt. Ew bi xwe jî di encama wî şiklê xwe de tûşî gelek bûyerên ecêb bûbû. Bi xwe behs nedikir. Xelkê behs dikirin. Min jî ji bav û birayê xwe dibihîst. An jî min ji diya xwe û diya Heme Ceza dibihîst. Lê ecêbmayî dimam. Min di dilê xwe de digot ew ji ko weha ye. Min Xalê Mecîd wek xwe û Heme Ceza didît. Hevalê me bû. Hema bêje ew jî di emrê me de bû. Bi tenê ferq ew bû ko ew ji me zîrektir, zanepeyvtir û bêtir dinya dîtibû. Pir hikayetên xweş zanîbû. Her gava ko wî gava xwe davêt malê ez û Heme Ceza dilşa dibûn. Me kitêb û defterên xwe zû dipêçan û em li dorberê wî diçûn û dihatin. Em her li dû wî bûn heta dema ko dihat û rûdinişt û me jî herdu aliyên wî digirt. Dû re Nezîre û Leylê digel kumên di destên wan de û diya Hem Ceza jî dihatin û wek me li dora wî rûdiniştin. Piştî ko wî çayek, mêwe, an jî hinek gwîz û mewîj dixwarin, li me dinerî û dipirsî:

— Ka ez binerim bê hûn zanin em doh li ko mabûn?

Me jî zû bersiv dida. Me qet şaş nedikir. Vêca wî bi dengekî ferîşteyî, bi reng û rûyekî ferîşteyî û bi hest û hiseke ferîşteyî dest bi dûmahiya hikayetê dikir. Em jî bêdeng û aram dibûn.

Ax Xalê Mecîd!... Min pêrar nûçeya mirina te bihîst. Gava min bihîst şeş sal bûn ko te ev dinyaya fanî li dû xwe hiştibû. Heme Ceza ji min re gotibû û hevdîtina me jî hevdîtineke ecêb bû. Ji bo karekî daîra min riya min bi dîwana wezaretê ketibû. Ez di korîdora beşa îdara wezaretê de diçûm û dihatim. Ez hingî pêrgî wî hatibûm. Her ji dûr ve min ew şiband, lê ez dudilî bûm. Ev şanzdeh sal bûn ko me hevdu nedîtibû. Derket ko ew ji min bîrtûjtir bû. Hema çavên me li hev ketin wî hemêza xwe vekir. Vêca dilê min jî ket cih ko ew bi xwe ye. Pirs min a yekê di derbarê bavê wî de bû, min got:

— Rewşa wî çawa ye?

Wî pir bi hêsanî got:

— Ev şeş sal in ko wefat kiriye.

Ez pir li ber ketim. Te digot qey min nûçeya mirina hevlekî xwe yê pir nêzîk bihîstibû.

Digel wê jî min jî got:

— Pir mixabin... Ez nû ji te dibihîzim.

Ev mesele li ba Heme Ceza êdî kevin bûbû. Bi awayekî normal got:

— Ev qedera her kesî ye.

Lê ez...

Rawestandina te ew ecêbmayî hiştine. Ew gumanan dikin. Bes e. Bimeşe.

]

(Wî) ew bi vî şeklî agahdar kir. Ew pê aciz bû. Got:

— Baş e, baş e, tu dikî ko mesele ne xweş bibe.

(Wî) got:

— Ez ji bo te dibêjim. Tu binere... Va ye kalek jî hatiye ber derî. Rawestiyaye û li te dinere. Fermo, ew e, tu dibînî ji mala Xalê Mecîd jî du zarok derketine derve û li te hûr dinerin.

Ev her hêrs bû. Got:

— Bila ne ji bo min be. Ez çî tiştê naşîrîn dikim! Vir taxa min e û ez hatime seredana wê.

(Wî) hêdî got:

— Ez vê dizanim. Lê ew nizanin. De fermo, ez weha his dikim ko ew xortê ha bi hêrs li te dinere. Ew du zarokên din jî çûn û dayikên xwe anîn ber derî. Dora te hatiye girtin. Tu ê çawan ji nav derkevî? Tu ê çî bersivê bidî? Hêrs û aciziyaya wî daket. Ecêbmayî ma. Xwest bide rê û here. Lê his kir ko êdî mesele ji destê wî derketiye. Di cihê xwe de çikiya...

[...Ez diçim û bi lez dikevim hundirê malê. Hemû laşê min di xwêdanê de maye. Ez pir tî bûme. Diçim ber mûslixa avê û devê xwe diximê. Ez têr avê vedixwim. Diya min û Leylê li hêwanê rûniştine. Ez xwe di teniştaya wan re hol dikim û dikevim hundirê odê. Xarên min di taqê de ne. Di kîsikekî spî de ne û min ew di binê kitêbên xwe de veşartine. Ez zû radihêjimê û dixim bêrîka xwe. Ez dîsa bi aliyê wan de didim lotikan û derdikevim derve. Dengê banga diya min tê ber guhê min. Ez têngihêjim ew çî dibêje û çî ji min dixwaze. Ez bi lez di deriyê hewşê re derdikevim derve. Pîra Atê û Hemîde Xan hatine ko biçin ba diya min. Ez li Pîra Atê diqeilibim. Ew li ser piştê li erdê dikeve û ji ser hişê xwe diçe. Hemîde Xan dike qîrîn û hawar. Diya min û Leylê bi dengê wê re derdikevin. Cîran jî bi dû wan de tî. Ez baz didim.

.Havîn e û stare û serban... Ez, kekê min û Leylê em di nav vê stareyê de radizên. Diya min, bavê min û xuşka min a biçûk Nesrîn jî di nav wê stareya han de radizên. Sibeh e. Hemû ji xew rabûne û daketine xwarê. Ez jî nuh ji xew rabûme û min çavên xwe vekirine. Dibînim ko kekê min

Nezîre hembêz kiriye û maçî dike. Ez zû çavên xwe digirim. Ez nabînim û dengê wan nabihîzim. Dengê wan pir nizim e. Nizanim dibêjin çî. Nizanim ew behsa çî dikin. Hest dikim ko Nezîre hêrs e. Ez çavên xwe vedikim ko bizanim çî ye. Dibînim Nezîre dixwaze here lê kekê min nahêle. Min dîsa çavên xwe girtin. Teperepa lingên Nezîre dihat min ko ew diçû. Min wê çaxê xwe piçekî livand û tevgeriyam. Min xwe bi xwe got ko bila kekê min nizanibe ko haya min ji wan hebû. Min xwe weha nîşan da ko ez a niha ji xew radibim. Lê haya wî her ji min tunebû. Min dît ko kekê min rabûye ser xwe û li aliyê stareya mala Nezîre dinere.

.Zivistaneke sar û sext e. Berfeke pir bariya ye. Ev bîst û pênc rojên bavê min e ko ketiye nav nivînan. Kekê min bê kar e. Leylê di bin axê de ye. Nesrîn niha di dirûtina kuman de cihê wê girtiye. Cêwiyek di hembêza diya min de ye. Zivistanek e ko di kûrahiya bîr û hişê min de pir sar û sexttir e... Gelek diwartir e. Bav tim û tim dinale. Du caran dinale. Tu dibêjî qey xweliya miriyan bi ser wî de hatiye dakirin. Rojê deh caran xwîna sor ji tiliya Nesrînê ya girdikê û tiliya eşedê ya destê çepê tê û ew nabêje ay. Cêwîk berdewam bi îskînî digirîn. Diya min jî bi giriyeke bédeng bersiva wan dide... Ax zivistana sar û diwar!.. Ez jî bi bêdesthilatiyeke dilbirîn hîn jî serê sibehan ji xew radibim, pak dest û rûyê xwe dişom, porê xwe şeh dikim û rast dikim. Li dest û neynûkên xwe dinerim û dilê min dikeve cih. Destmala min a spî di bêrîka min de ye. Pak û temîz û wek çira şîr spî ye. Ez ber bi aliyê taqa xwe ve diçim. Ez li şema darsa xwe ya ko min bi dîwarê hundurê taqê ve zeliqandiye dinerim. Tiliya xwe datînim ser. Ez li gora wê defter û kitêban yek bi yek ji hev cida dikim. Ez qelem û qelemtraş û jêbirê jî datînim aliyekî. Diya min jî bo amadekirina nanê hişk û çaya rojane rûniştiye. Tiştê nabêje û gotinek ji devê wê dernakeve. Nanekî datîne ber min. Qedeha çayê ji min re dadigire û dide min. Ez bi xweşî dixwim û vedixwim. Ew bi çavekî bi tirs û xem li min dinere û tiştêkî

nabêje. Gotinek ji devê wê dernakeve. Ez radibim û ber bi kitêbên xwe ve diçim. Ez wan dixim çenteyê xwe yê teneke. Ez çente dixim bin çengê xwe û ber bi kolana ko berf li kabokan bû dimeşim.

Ji nişka ve şerek di navbera bavê min û birayê min de dest pê kir. Dû re kekê min ji mal derket û nema vegeyriya. Heta du mehan kesî nizanîbû ew çûye ko û li ko ye. Her zû hat zanîn ko ew ne li bajêr e. Tu nas û meriv li bajêr neman ko em neçûn malên wan û me lê nepirsî. Bêsûd bû. Eserek jê derneket. Piştî ko deng ji birayê min derneket, pevçûnek ket navbera diya min û bavê min. Wan rojan mala me bûbû wek dogehê. Diya min xeyîdî û çû. Paşê hat û dîsa çû. Ê dîsa vegeyriya. Bavê min di navbera du agirên de dişewitî. Agirê kezebê ew rapêça. Çû Pênciwênê, Qeladizê, Raniyayê û Qeraxê lê bê fêde bû. Ew ket hundirê bêçaretî û xemeke mezin. Xew û xwarin lê nema bû. Ji aliyê din ve jî diya min jê aciz bû û pê re nedipeyivî. Diya min bi xwe jî di hundirê xemekê de bû, digiriya û dibiland. Heta ko rojekê xaltîka min derket û hat. Hema wê gava xwe avêt hundir ji diya min re got:

— Mizgîna min li te, mizgîna min li te.

Diya min ji cihê xwe pengizî ser lingan. Devê wê ketibû hev, nikarîbû bipeyiviya. Xaltîka min zû got:

— Ew li Kerkûkê ye.

Diya min bi carekê ve xwe hazir kir. Bi destê min girt û ez bi dû xwe de kişîşandim. Em li otobuseke textîn siwar bûn. Em li der û dora esir gihîştin ber wê malê û em ji otobusê daketin. Diya min wek dînan ket hundir. Silav neda. Li hal û wextê maliyan nepirsî. Tenê zû zû digot:

— Ka, ka?!

Pîrejinek û jineke sere bi dengê wê ve hatin. Şaş bûbûn. Komê zarok jî li dora wan diçûn û dihatin. Min dît pîrejinê diya min hembêz kir û rûyê wê maçî kir. Jina sere jî her weha. Lê diya min her bêsebir digot:

— Ka, ka?!

Min bihîst ko pîrejinê bi ecêbmayî got:

— Çi bûye, çi qewimî ye?

Diya min dîsa pir bi perîşanî got:

— Kurê min, ka kurê min?

Mîna ko wê pîrejinê niha sira meselê fêhm kiribû. Zû bi lez got:

— Li dikanê ye, li dikanê ye, ew ê a niha bên.

Wê gavê diya min ji ser hişê xwe çû. Pîrê rûnişt û serê wê danî ser çokên xwe. Jina sere çû kevnikek anî, şewitand û nêzîkî bêvila wê kir. Diya min hat ser hişê xwe. Kekê min jî ket hundir. Gava kekê min çav li min ket, matmayî ma. Paşê, gava wî diya min dît veciniqî û bi lez ber bi wê çû, ew hembêz kir û girî ketibû qirikê, got:

— Dayê...

Diya min dîsa ji ser hişê xwe çû, lê bi bêhna pîşo hat ser hişê xwe. Vê carê ew hêdî hêdî geştir dibû. Her ko dem derbas dibû ew bêtir zindî dibû û ken li rûyê wê peyda dibû.

Dotira rojê gava em diçûn ko li otobusa textîn siwar bibin û ber bi bajêr vegehin, kekê min em li ber dikanê sekinandin û ji min re got:

— Kîjan çente ji bo kitêbên te xweşik e ko ez ji te re bikirim...

Roja Erefatê ye. Hemû tiştên min tamam e. Tenê pêlava min kême e. Bavê min ji diya min re got:

— Pêlavên wî ne qetiyayî ne. Tune ye, hek hebûya min ê bikiriya.

Pêlavên min ne qetiyayî bûn lê kevin bûn. Ez ji gotina bavê xwe pir dilteng bûm. Digel wê jî min tiştek negot. Ez çûm aliyê din û bi jarî rûniştim. Bavê min çû derve. Diya min ber bi min ve hat, ez maç kirim û got:

— Xemgîn mebe... Tu bi xwe dizanî ger hebûya wî ê bikiriya.

Kekê min ket hundir. Wî mesele fêhm kir. Destê xwe xist bêrîka xwe û çî tê de hebû derxist. Hejmart. Got:

— Ev têr dike û ji ber jî dimîne. Rabe, em herin bazarê.

Cejn e... Xalê Mecîd serê sibê hat û pêncî fils dan min. Bavê min jî du pêncî. Gelo ez neçim seredana mala xaltîka xwe? Ez çûm û min destên wan maçî kirin. Apê Salih jî pênciyek da min û ez vegeyriyam malê. Çar pênciyên min hene. Ez digel Heme Ceza diçim û li ereba hespan siwar bûm. Em vedigerin ber bi malê, bi aliyê çerxûfeleka Meta Xumsar. Gelo ew niha di çi rewşê de ye? Pehînek li çoka Ehe da. Ehe şûm bû. Wî di lîstikê de fen dikir. Berdewam lêdan dixwar, lê bêar bû. Birayê wî Xule jî eynî nimûneyekî weke wî bû. Ew di emrê me de bû. Lê wî her tim dikarîbû em bixapandina. Bi taybetî di şikandina şirûban de. Min dixwest ez tenê carekê piştî wî bidim erdê, lê bê fêde bû. Bi eşkere min heft dişikandin, wî çar, lê dîsa jî ez li zîrarê bûm. Yê zora wî diçû her ez bûm. A... Eşedûbîla, Heme Ceza baş bû. Heme Ceza ji heqê wî derdiket. Simê Sor jî her wilo. Herdu bi hev re diketin kirê wî û ew baş aciz dikirin. Gelo çi bi Simê Sor hatiye? Ecêb e. Heta niha ne min ew dîtiye ne jî min tiştê jê bihîstiye! Gelo bavê wî? Ew tekane bû. Ew piştî sê zik keç hatibû dinyayê. Gelo xuşkên wî? Ew wê çaxê kamil û gihiştîbûn. Na... E... Mezina wan nû zewicî bû. Bi, bi, na, nizanim, navê wî nayê bîra min. Dawet tê bîra min. Daweta wan sê rojan taxa me rakiribû ser lingan. Ez û Heme Ceza û Simê, dirêjahiya wan sê rojan, karê me tenê ew bû ko em di dema govendê de, huçikên jinên govendkêş ji pişt ve girê bidin. Vêca ko yekê ji wan dest berdida û xelkê ew bi wî şiklî didîtin, pê dikeniyan. Em jî pê şa dibûn. Ez jî di wê sala ko em çûbûn Mişîrawa seyranê, min weha li kekê xwe û Nezîre kir. Kekê min şal û şapik lê bû û milê şapikê wî dirêj bû. Kekê min serê govendê dikişand. Nezîre jî di destê wî ê çepê de bû. Ya ko ez dajotim ser girêdana wan ew bû ji bo ko min ew di stareyê de dîtibûn. Min pir ji dil dixwest ko ew heta heta bi hev ve werin girêdan. Lê hêvîya min nehat cih. Ax, xwezî bûbûya.

Otobuseke textîn û jihevdeketî. Li ser banê otobusê tije qaf û qût. Di hundirê otobuê de jî şofêrek û heft mirovên ko serî hildane û ber bi derbederiyê ve diçin. Çend deşt û newal û daristanan derbas dikin û diçin... Ew digihîjin hemberî çiyayekî sext û bilind û bi riya fitlonek de hêdî bi çiyê ve bi hewa dikevin. Di nîvê çiyê de otobusa wan ji taqet dikeve û radiweste. Şofêr pê li firênê dike û dike hawar:

— Bilezînin, kevirekî deynin ber tekerê paşiyê.

Kekê min û bavê min bi lez xwe davêjin jêr. Her yek ji wan zû radihêjin kevirekî mezin û datînin ber tekerên dawiyê. Ez li cihê xwe rûniştîme û li şofêr dinerim. Di destpêkê de ew biziya bû, niha ez dibînim ko ew bi ser xwe ve hatiye, dibînim dadikeve jêr. Diçe û bi bavê min û birayê min re dikeve peyvê. Dengê wan nayê min bê çi dibêjin. Ez dibînim ko bavê min bi destê xwe ber bi me ve îşaret dike, paşê destê xwe ber bi çiya ve bilind dike. Ez weha têdigîjim ko divê em dakevin jêr û bi meşê bi jor bikevin da şofêr bikaribe otobusê ber bi jor ve biajo. Dibînim kekê min jî her weha dibêje. Bavê min û şofêr rawestiyane û dipeyivin. Kekê min ber bi wa ve gavan davêje. Ez tengijî bûm. Ez li bende bûm ko bavê min û kekê min destên xwe biavêjin berstukura şofêr û jê re bêjin:

— Heke ne tu û otobusa te ya nalet bûya wê çi bikarîba em bixapandina? Wê çi bikarîba em ji wê herêmê hilbikirana û ev riya çûn û nehatê bida ber me?

Dîsa jê re dibêjin:

— Yela, te em ji ko anîne dîsa me bibe wir. De, te em çawa anîne dîsa me vegeirîne.

Ez weha li bende bûm. Lê ez dibînim kekê min tê û dibêje:

— Dakevin jêr, em ê bi meşê bi jor bikevin.

Ez ji nişka ve diteqim û êrîş dikim. Hema bi carekê ve min xwe gihand pişt dîreksiyon. Otomobîl şixuland. Min berê otobomobîlê ber bi jêr ve kir.

Min destê xwe yê çepê dirêjî derve kir, min bavê xwe û kekê xwe xistin otomobîlê û min bi hemû hêza xwe pê li gazê kir. Otomobîl ji erdê ber bi esmên ve bilind bû. Deşt û berî, çiya û neweal û daristanên hov li jêrî me man. Em bi xurtî di ser wan re difiriyan û me hema xwe li malê danî. Min bi xwe di hundirê cigarekê de hemû qaf û qût kişandin jor. Min her yek ji wan danî cihê wan. Ê em hemû dikevin hewa xwe ya berê. Hewa min a berê bazdana li nav kolanê bû. Ji malê difilitim derve. Heme Ceza dibînim û ber bi wî ve baz didim. Bangî wî dikim...

Heme Ceza!..

Tu bi desta dipeyvî!... Heme Cezayê çi? Hişê xwe bîne serê xwe!].

(Wî) ew vecinîqand û weha jê re got. Gava ew hat ser hişê xwe û ber bi jor ve nerî dît ko ew xortê ha hat hemberî wî û dibêje:

— Mamosta bibexşîne, weha diyar e tu li malekê digerî û nikarî bibînî. Ez amade me ko alîkariya te bikim.

(Ew) aram bû û êmin bû. Ew jî bêqerar bû. Nizanîbû çi bersivê bide. Demekê fikirî. Li der û dora xwe nerî. Pîremêr, jin û pîrejîn, du zarok û diya wan, hemûya lê dinerîn û hemû li bende bûn. Hingî wî li lêwik nerî û bi dengekî pir dilovan jê re got:

— Kekê min... Ez li vê taxê... Li vê kolanê... Aha li vê malê hatime dinyayê û min salên xwe yên zaroktiyê li wir bihurandine. Niha piştî bîst û pênc salan, riya min bi vir ketiye û tê re dibuhurim. Mesele bi tenê ev e. Ez spasê te dikim. Nizanim tu têdigihêjî ez çi dibêjim an na.

Lêwik bersiva wî neda. Berê xwe jê guhert, berê xwe bi pîremêr ve kir, destê xwe jê re bilind kir û bang kirê:

— Were bavo can.

Gava pîremêr gihîşt ba wan, lêwik gotinên wî jê re dubare kirin. Çaxê pîremêr ev bihîst, gavekê ber bi paş ve vekişiya, bi hûrî li ser û çavên wî nerî û got:

— Ma tu Heme Eliyê Hecî Qadir î?

Ew sersem bû. Bîst û pênc sal e. Wî çawa ew nas kir. Digel wê jî wî got:

— Belê, ez ew im.

Wê gava pîremêr ber bi wî ve çû, ew hemêz kir, du-sê caran li ser hev maçî kir. Paşê bi destê wî girt û got:

— Were!

Wî nizanîbû çî bike û çî bêje. (Wî) perdeya bêdengiyê çirand. Got:

— Here!... Firsendedek e û ketiye destê te. Ne dûr e ko tu bêî fermokirinê biçî hundir.

Wî bi ya wî kir. Da dû pîremêr û meşiya. Jin û pîrejin matmayî mabûn.

Gava hemû gihîştin ba wan, pîremêr ji pîrejinê re got:

— Heme Elî kurê Hecî Qadir e.

Pîrejinê got:

— Kîjan Hecî Qadir?

— Hecî Qadirê Şerbeto.

Wê çaxê pîrejin jî geş bû. Hemû bi hev re çûn hundir. Rûniştin. Pîremêr cihekî xênî îşaret kir û got:

— Hê jî her weke xwe ye. Min çawa ji bavê te kiriye min weha hiştiye. Mîna tu dibînî, bi tenê rexê wî aliyî hatiye guhertin.

Ew dibîne... Sertenûr kiribûn metbax, serşok û avdestxane rêk û pêk bû.

Herweha dît ko mûslixa li hewşê jî hatiye guhertin. Got:

— Ber mûslixê jî... Di dema xwe de kevirêj bû. Niha hawizekî çimento ye.

Herweha avero jî. Pîremêr pê re bişirî û got:

— Bîra te kûr e... Bavê te jî weha bû. Gava em rûdiniştin û me qala salên zaroktiyê dikir, te digot qey defterek di destê wî de ye û ji min re dixwîne.

Tu ya rastî bixwazî, pîremêr bi xwe jî defterek di dest de bû. Wek firsenedeke taybetî ketibe destê wî, rûpel bi rûpel dest bi xwendinê kir.

Karê ji riya dûr jê re hatibû ko diviyabû bike, di ser guhê xwe re avêt û bi eynî celebî li pîremêr guhdarî kir.

Ji soranî: Ferhad Shakely & Firat Cewerî

© Nivîskar, Nûdem û Nefel

Nivîskar: HUSÊN ARIF

Weşandin: 2005-06-27

Xwendin: 10351

**

Ji bo kovarekê

» Receb Dildar Dê di paldankê de paldabû. Van rojan lê sor bûbû, ji qîza xwe re cêhzan çêdikir. Nîka ko bi hosteyî tayê sipî lê digerand û tenteneya destê xwe lê zêde dikir danî kêleka xwe, wek ko dinya fetih kiribe, bi dilxweşî çavên xwe li ser tenteneya ko çêdikir gerand, pişt re mînaka destê xwe bilind kir û rê keça xwe da.

«Gulê hela lê binêre ev mînak çiqas xweşik e»

«Dayê belasebe çêneke û xwe pê re aciz neke, ev çend car e ez ji te re dibêjim, ez na-ze-wi-cim, tamam?»

Dê qet xwe aciz nekir, wek ko qet tiştek jê re nehatibe gotin axaftina xwe domand:

«Îcar çima nazewicî, gava ez di emrê te de bûm, du zarok li destê min bûn.»

Gulê hinekî din jî xwe îşk kir.

«Tu tu yî, ez ez im, te fam kir ?»

«Ez dizanim ez ez im, tu jî tu yî, lê dîsa jî bizewice û mala xwe deyne, rojek berê kevçî û kodên xwe nas bike» destê xwe li hundurê odeyê gerand û wek ko xêncî wê mala kesî, zarokên kesî tunebin «binêre mala min, zarokên min hene çi xweş e»

Keçê dixwest mijarê biguhere, mînderek danî erdê û li ber çokên diya xwe rûnişt. Di destê wê de qelem û defter hebûn, xwe li ber dilê dêya xwe hinekî şêrîn kir û dest bi pirsaxwe kir :

«Dayê rehme, bavê min çawa hat girtin? Li ber çavên min hinek wêne hene, lê tam nayê bîra min.»

«Wê çawa were bîra te, tu wê çaxê hîna sêsalî bûyî.»

Keçik ji cîyê xwe rabû, bi lez berê xwe da mitbaxê, li ser tebsîyê tevlî du heb çayan vegeşîya û wek pisîkekê xwe xist binê çengê diya xwe.

«Eger tu ji nû ve vebêjî ez ê hinek notan binivîsînim.»

«Wê çaxê tu û kekê xwe li destê min bûn. Bavê te metbeayê seyar anîbû malê, wê çaxê wek aniha compûter, înternet, fotokopî tunebûn, metbeayên hebûn jî destê dewletê digîhişt wan. Ez û bavê te, em ji êvarê de rûdiniştin heta danê sibê, me dused kovarê xwe çap dikir, lê di me de jî, tu teqet nedima, halê me dibû halê helawçîya, em tev di hubrê de diman, hûn jî carna di nav hubrê de digevizîn.»

Gulê ji gotinên diya xwe parek gîhand xwe û bi ken axifî:

«Min jî digot, nivîskarîya min ji kû tê, tu ne bê min ji zarokatiya xwe de hubur alastiye.» Hinek din jî xwe xist binê çengê diya xwe û peyva xwe domand. «Îcar we çawa çap dikir hela hinek qal bike.»

«Ez çawa qal bikim keça min, bi êvarê re me derîyê hewşê asê dikir û bataniyêke stûr bi ser pencereya xwe ve dikir ko ji derve şoqa odeyê xuya neke. Wê çaxê me quncikeke hewşa xwe beton nekiribû, bavê te ji textikan pîneke seyar çêkiribû û danîbû ser axê, me di wê derê de werdek xwedî dikirin. Bavê te metbea di bin pîna werdekan de diveşart, şeva ko

me yê kovar çap bikira, ji bo deng dernexin, me werdekên xwe ji êvarê de dixist xanîkê sergînan.”

”Birra jî ha ! Wê çaxê em bi sergînan çawa germ dibûn?”

”Ez her tim ji we re dibêjim, qîmeta jiyana xwe bizanibin, em di nav rêx û rijikê de mezin bûn. Ma wê tîna sergîna çibe? Wek agirê li ber bayê bû, çawa pê diket ûsa jî ditefîya. Lê her tim me sergînan nedîşewitandin, her zivistan bavê te ji me re toneke êzing distend me ew di nav hev re dikir. Lê piştî ko bavê te ket girtîgehê çavên me bi êzingan neket.”

”Te mijar dîsa belav kir, were ser pînê.”

”Bavê te di bin pînê de tiştêk wek mezel çêkiribû, wek mezelê zarokek biçûçik bû, her çar aliyê wê beton kiribû û ji bo ser wê jî, ji texteyan devgirtekek çêkiribû, ser wê jî tije ax kiribû, pîna seyar jî datanî ser axê û me werdekên xwe tê de xwedî dikirin.”

”Bavê min jî yeman bûye ha! Wê çaxê her şeva ko we kovar çap dikir, pîn xera dibû, bi sibê re jî, ji nû ve ava dibû.”

”Eynî ûsa bû keça min, îcar tu dizanî havînên Amedê çiqas germ in, wê çaxê klîma milîma jî tune bûn, derî û pencere girtî em di hundur de ji xwêdanê dibûn av. Îcar gava destê sibê ji bo cîdana metbeayê û serrastkirina pînê bavê te derdiket hewşê xwêdana wî lê dicemidî, ji xwe bavê te zû serma digirt û nexweş diket.”

”Karekî gelek zehmet bûye.”

”Zehmetîya wî gelek bû, lê xweşiyên wî jî hebûn, gava me dest bi çapê dikir, bi rûpela pêşîn re rûyê bavê te dikenîya û bi dilçûyîneke nedîtî navê kovarê dixwend û tiştêkî din jî hebû ko kêfa me gelek jê re dihat, piştî kar bidawî dibû û me kovar dida ser hev me çayek çê dikir, pala xwe dida dîwar û çaya germ vedixwar, çaya me, betilandina me tev de bixwe re dibir.”

Te di got qey dê çûbû şevên kovar çap kirinê û ji nû ve kovarê çap dike, bi wê heyecanê Gulê ji bîr kiribû. Gulê hêdîka destê xwe li çoka diya xwe xist û ew ji dinyaya xeyalan azad kir.

"Navê kovarê tê bîra te dayê, navê wê çibû?"

"Ez çawa ji bîr dikim keça min, Navê wê "Dengê Kurdîstan" bû. Wê çaxê ev kovar pirr bi rûmet bû, di ser darbeya Kenan Evren re du sal derbas bûbû, girtîgeh tije însan kiribûn, heroj bi îşkenceyan însan dikuştin, ên ji derve mabûn revîyabûn, tu berxwedanek nemabû ji ber vê yekê kovar ji bo gelek însanan bûbû hêvîyek û çavên wan li kovarê bû."

"Tu nabêjî wê çaxê we karekî pirr muhîm dikir."

"Bi rastî jî ûsa bû keça min, wê çaxê ji ber peyvên kurd û komunîst kesê newêribû tîpa "k" bi kar bianîyana, me kovar çap dikir û bavê te dibir belav dikir."

"Xwezî aniha yek hebûya, min bidîta."

"Nivîsên wê kurdî û tirkî bûn, ez dizanim du helbestên bavên te bi kurdî tê de weşîyan."

Gulê wek ko bixwe bixwe bipeyive:

"Te yê qala bavê min bikira?"

"Eger tu ecele nekî ez ê bibêjim, Tu neh mehan çawa di zikê diya xwe de mayî meriv şaş dimîne?"

"Ew ya ji xwe bipirse." Keçikê got û herdu bi hev re bi dengekî bilind kenîyan.

Dê hinekî bîhna xwe da û ji nû ve destpê kir:

"Dawîya payîzê bû, wê şevê dîsa me kovar çap kiribû, serê sibeyê bavê te ew girt û çû. Çend rojan nehat, em ketibûn tatêla wî lê wek aniha telefon tunebûn ko meriv li hevdu bipirse. Ber êvarê bû, me xwe li ber dîwarê cîranan dabû berrojê, tu jî li cem min bûyî, ji ber ko ji me xuya bû me

derîyê hewşê serpiştê hîştibû, me bi carekê ve dît ko ber derê me bû garana erebeyên polîsan û êrîşî ser hewşê kirin.”

”Belê, ev wêne tê ber çavên min, lê zelal nîne.”

”Min mêze kir bavê te di nav xwe re kirine û wî jî dibin hewşê, ser çavên wî tev mor û reş bûbûn, dilukumî, bi zorê xwe dida ser lingê xwe, ketibûn milên wî, bi nêrînên revok li hêla me mêze kir, wê gavê êdî min fam kiribû ko mala bavê min ji binî de xera bûye. Ez pir tirsîyabûm, min çawa tu girtîye hemêza xwe û min berê xwe dayê mala kalê te ez jî nizanim. Ji xwe piştî wê rojê ji tirsan em neçûn malê, qansî şeş mehan li mala kalê te man.”

”Dayê, bavê min li kû hatibû girtin?”

”Berî wî hinek hevalên wî hatine girtin, gava kovarê dibe ji wan re, dikeve dafika polîsan û paşê dest bi îşkenceyan dikin. Xêncî wê roja ew anîn malê, êdî çavên me pê neket, me ne dizanibû sax e, ne dizanibû mirî ye, du meh şûn de nameya wî gîhişt me ko li girtîgeha Amedê ye, gava me ew dît, goşt li ser nemabû, nîvmirî bû.”

”Gava em diçûn dîtina bavê min malek hebû em diçûnê ne ûsa?”

”Mala Gewrê bû, Xwedê yeka wan bike hezar, wê gavê li nêzî girtîgehê mal tunebûn, erebe nediçûn wê hêlê, di kelekela germa havînê de, zivistanê di sar û sermayê de min bi destê we yekê digirt, yek jî dida piştî xwe em bi linga di nav wê çamûra rezan re diçûn dîtina bavê te. Mala Gewrê li ser rê bû, havînan me lê av vedixwar xwe hênik dikir, zivistanan min hûn didan ber sobeya wan û germ dikir.” Çavên wê tije bûbûn êdî dengê wê diguherî, tepikek li nav piştî keça xwe xist û da nav henekan.

”Di rêya girtîgehê de qey min hûn hindik li piştî xwe kirine kêzê, aniha hûn me naecibînin.”

Keçikê jî heneka wê domand:

"Me tiştekan ne gotîye diya min, hîna tu ji min ciwantir î, gava tu pîr bûyî zarokên min ê jî te li piştta xwe bikin."

"Dawîya dawî tu hatî ser a min, ma bê zewac zarok çêdibin.»

Keçikê ew gotinan ne bihîst, destê xwe dabû cênîka xwe û kûr kûr diponijî.

"Aniha ev tişt tev de ji bo kovarekê hatin serê me"

"Belê keça min tev de ji bo kovarekê bûn."

Nivîskar: RECEB DILDAR

Weşandin: 2005-06-28

Xwendin: 10541

**

Pêşgotina Antolojiya çîrokên kurdî

Fikra amadekirina antolojiyê

Deh salên Nûdemê ez westandibûm. Ez welê westiyabûm ko min bawer nedikir ez ê zû bi zû bi ser xwe ve werim. Bi gotineke din, ez kerixî bûm, ji hal de ketibûm û bêtaqet bûbûm. Lê piştî rawestandina Nûdemê, piştgirî û jidiliya ko ji nivîskar û xwendevanên kurd hatin, kir ko dîsa xwîneke nû di laşê min de bigere, enerjîyeke nû hat min û wê enerjîyê ez ajotim ser amadekirin û derxistina vê berhema di destê we de.

Hê dema ko min Nûdem derdixist, bi Nûdemê re dest bi weşandina kitêbên kurdî kiribû û meyla xwe berdabû ser wergera ji edebiyata dinyayê, min hingî dixwest ez ji her zimanekî, an jî ji zimanên ko em dikarin jê wergerînin, antolojiya edebiyata wan zimanan amade bikin û bi vê yekê zimanê kurdî û xwendevanên kurd bikin şîrîkên edebiyat û zimanên dinyayê. Lê min dixwest ez pêşî ji edebiyata kurdî dest pê bikim û antolojiyeke çîrokên kurdî amade bikim. Yek jê ez bi xwe çîroknivîs im û ji hunera çîrokê hez dikim, ya din jî min hewcedarî û valahiyeke mezin

di warê çîrok û çîroknivîskariya kurdî de didît. Gava piştî heft-heyşt salên weşana Nûdemê, min çavek li çîrokên Nûdemê gerand, min dît ko tibabek çîrok hatine weşandin. Çîrokên her demê, her beş û zaravayî, lê bi kurmanciya latînî. Min hingî biryar da ko ez antolojiyeke çîrokên kurdî amade bikim. Lê, min digot ez ê antolojiya çîrokên Nûdemê, di pîrozbahiya dehsaliya Nûdemê de derxim. Ew ê antolojiya çîrokên kurdî bûya, lê wê çîroknivîsên hemû beşên Kurdistanê û çîroka kurdî bi giştî temsîl nekira. Wê tenê bi Nûdemê sînorkirî bimaya. Ew jî ne hindik bûn, piraniya çîroknivîsên kurd tê de hebûn, lê beşê soranî jê kêmbû. Amadekirina antolojiyeke welê wê ji bo min pir hêsan bûya. Min ê bi tenê çîrokên Nûdemê bicivandina, ew ji nû ve di ber çavan re derbas bikirana û bida çapê. Wê ji bo min hêsan bûya, lê wê antolojiyê çîroka kurdî bi giştî temsîl nekira. Wê bi tenê bibûya »Antolojiya çîrokên Nûdemê«.

Ne ko hewcedarî bi tişteki welê jî tunebû, hê jî heye. Gelek kovarên dinyayê, antolojiyên çîrok û helbestên pêncsalî, an jî dehsaliya kovarên xwe derdixin. Ne bi tenê antolojiyên çîrok û helbestan, ew antolojiyên gotar, rexne, nivîsên felsefî û hevpeyvînên bijarte jî derdixin. Xebatên welê encama berhema xizmetên kovarê diyar dikin. Ev yek li ba me nebûye adetek. Ji ber ko kovarên me ên temendirêj kêmbûne, bi qasî ko di beşên cihê de antolojiyan amade bikin berhem tunebûne, an jî heke yek liban kovarên temendirêj derketibin jî, bêimkanî li pêşberî amadekirin û weşandina antolojiyan bûye asteng.

Gava piştî amadekirina vê antolojiyê min dîsa çavek li her çil hejmarên Nûdemê gerand, min mijarên gelek antolojiyan tê de dît. Lê, em ê vê yekê ji pêşerojê û ji nivîsê nû re bihêlin.

Herçiqas ez li ser amadekirina antolojiyeke çîrokên kurdî ya berfireh rawestiyabim û fikirîbim jî, fikra amadekirina antolojiyeke çîrokên kurdî ya giştî, ko hemû çîrokên Kurdistanê û çîroknivîsên Kurdistanê yên hemû

dem û zaravayan temsîl bike, vê dawiyê, yanî berî derketina vê antolojiyê bi salekê-du salan bi min re çêbû.

Min ji xwe hemû çîrokên ko di Nûdemê de hatibûn weşandin civandibûn, di nav wan de hilbijartinek çêkiribû, ew bi qasî antolojiyeke li dor 800 rûpelî amade kiribû, lê, dîsa jî min dipirsî, min li fikir û nêrînên hevalan guhdarî dikir, min dixwest ew li ser antolojiyeke bi vî babetî fikrên xwe bibêjin, pêşniyazan bînin, da ez jî di bin ronahiya fikir û ramanên wan de antolojiyeke ko temsîla çîrokên kurdî bi giştî dike, amade bikim. Hinan gotin, tu dikarî bi tenê antolojiya çîrokên Kurdistanê Tirkîyê amade bikî, hinan gotin, na, bi tenê çîrokên kurmançî, hinan gotin, heke tu ê navê »Antolojiya çîrokên kurdî« lê bikî, divê çîrokên hemû beşên Kurdistanê tê de hebin.

Ez jî bi vê pêşniyaza dawî ve hatim girêdan, min çîrokên hemû beşên Kurdistanê, çîrokên kurdî yên hemû deman xistinê.

Lê vê yekê karê min zehmettir kir. Herçiqas ji tecrubeyên Nûdemê haya min ji çîroka kurdî bi giştî hebû jî, ji ber ko ez ne şarezayê zaravayên kurdî ên din im û ji ber ko ez xamê alfabeyên ko zimanê kurdî pê dihat û tê nivîsandin im, loma, ew karê ko min bawer dikir li ber qedandinê ye, du salên din jî lê zêde bûn.

Min jî bêhna xwe fireh kir. Min xwest ev antolojî bi rastî jî bibe antolojiya çîrokên kurdî bi giştî û bi giştî çîroka kurdî temsîl bike. Loma, ez bi hilbijartina çîrokên soranî û çîrokên kurdên Sovyeta berê ketim. Ji bo çîrokên kurmançiya jêr (soranî) bi alîkariya Ferhad Shakely û ji bo çîrokên kurdî yên Sovyeta berê jî bi alîkariya Têmûrê Xelîl min hilbijartinek çêkir û ev kar bir serî.

Lê min ev antolojî li ser bingehê mijareke taybetî ava nekiriye. Mîna tê zanîn, gelek antolojiyên çîrok û helbestan li gora demên dîrokê ên cihê, an jî li gora mijar û temayên cihê tên amadekirin. Ez dibêjim hewcedariya

me ji niha ve bi antolojiyên ko li ser mijar û babetên cihê radiwestin heye. Lê, armanca min bi vê antolojiyê derxistina kapasîteya çîroknivîskariya kurdî ye û bi riya biyografiya nivîskaran jî di eynî demê de amadekirina ansîklopediyeke çîroknivîskarên kurd e.

Min di vê antolojiyê de çîrokên ko bi hersê zaravayên kurdî yên sereke; kurmancî, soranî û zazakî hatine nivîsandin û bi alfabeyên latînî, erebî û kirîlî hatine nivîsandin bingeh girtiye. Mîna tê zanîn, zimanê kurdî bi sê zaravayên sereke tê nivîsandin. Ev jî rastiyeke me ye, bikaranîna alfabeyên cihê û ferqiyeta zaravayan ji hev têgihîştina me zehmettir dike. Loma, min zarê kurmanciya jor ji bo vê antolojiyê bingeh girt. Ji ber ko ez kurmancî ji zaravayên din çêtir zanim, ez bi karekî welê rabûm, lê, bêguman hebûna vê antolojiyê ya bi zaravayên din jî wê ronahiyekê bide dîroka edebiyata kurdî û wê bibe bingeha hevnasîn û hevtêgihîştina edebiyatvanên kurd.

Min di vê antolojiyê de alfabeya latînî bingeh girt. Em zanin ko heta demeke nêzîk jî zimanê kurdî bi alfabeya erebî dihat nivîsandin û hema bêje hemû klasîkên me bi alfabeya erebî hatine nivîsandin. Lê piştî avakirina komara Tirkiyê û bi derxistina kovara Hawarê (1932-1943) re, bi serkêşiya Celadet Alî Bedir-Xan, kurdên Kurdistana Tirkiyê û Sûriyê jî derbasî alfabeya latînî bûne. Digel wê jî, îro, piraniya kovar, rojname û weşanên ko derdikevin bi alfabeya erebî ne. Herçiqas em ji salên sihî û vir ve bi kurmanciya latînî dinivîsîn jî, dîsa piraniya berhemên kurdî bi alfabeyên erebî û kirîlî hatine nivîsandin. Piraniya çîrokên vê antolojiyê jî dîsa bi alfabeyên erebî û kirîlî hatibûn nivîsandin. Me ew hemû transkrîbeyî latînî kirin û me çîrokên soranî jî rasterast wergerandin kurmancî. Herçiqas ev »xwarina nan bi nan be« jî, lê ev rastiyeke me ye. Niha, bi riya ko hemû çîrok bi kurmancî ne, qet nebe wê xwendevanên

kurmanc di derheqê dîroka edebiyata kurdî de û di derheqê dîroka çîroka kurdî de bibin xwediyê fikrekê.

Fikra min jî ew bû ko ez bi vê riyê û bi vê antolojiyê sînorên asê yên di nava kurdan de rakim û pireke hevnasînê di navbera wan de ava bikim.

Rêzkirina çîrokan

Min pêşî çîrok li gora paşnavê çîroknivîsan bi rêz kiribûn, lê min paşê guhert û ew li gora pêşnavên nivîskaran bi rêz kirin. Min dû re dev ji wê fikrê jî berda. Min bi şêwrê anoloji li gora dîroka çîroknivîskariya çîroknivîs bi rêz kir. Yek jê, bi vî awayî hem mirov karê lêkolîneran hêsan dike, hem jî mirov dikare di derbarê proses, pêşketin an jî guhertinên ko di hunera kurteçîroka kurdî de bûye bibe xwediyê fikrekê. Lê ev metod jî ji bo min ne hêsan bû. Dîrokeke edebiyata kurdî ya nivîskî, an jî bîbliyografiyeke çîroknivîsên kurd bi kurmancî li ber destên min tunebû. Loma, ez ketim nêçîra çîroknivîsan û li dû dîroka weşandina çîroka wan a pêşî geriyam. Min çîrok ne li gora dîroka nivîskariya çîroknivîs, lê li gora dîroka weşana çîroka çîroknivîs ya pêşî girtiye. Bi vê riyê, bi vê metodê mirov ê bikaribe bi hêsanî kronolojiya çîroka kurdî derxe û ji prosesa çîroka kurdî têbigihîje. Bi gotineke din, mirov ê di derheqê çîroka kurdî ya doh û îro de bibe xwediyê fikrekê û guhertin û pêşketinên çîroka kurdî bibîne.

Avakirina komara Tirkiyê (1923) û rewşa ziman û edebiyat kurdî

Edebiyat bi zimên tê pê, ziman bingehê edebiyatê ye. Herçiqas di serdema Osmaniyan de rewşa zimanê kurdî ne mîna piştî komarê be jî, dîsa ew bi awayekî giştî ne zimanê perwerdê, ne zimanê ilm û zanîne, ne zimanê ticaret û birêvebirinê bû. Rast e ko di serdema osmanî de zimanê kurdî ne di hêsîriya îro de bû, ew mîna îro li qeyd û merbandan nehatibû xistin, cih bi cih bi vî zimanî perwerde hebû, di medreseyan de bi vî zimanî dihat xwendin. Wek encama medreseyan jî îro klasîkên kurdî di destên

me de hene. Lê piştî şerê cîhanê ê yekê û avakirina komara Tirkîyê, ne bi carekê be jî, desthilatdariya yekpartî ya Kemalîzmê, dixwaze mederseyan bigire û bi wê yekê dawiyê li bermayên osmaniyan bîne. Şoreşa kinc û alfabejê jî wê demê li dar dikeve. Slogana yek netewe, yek al, yek ziman wê çaxê dibe bingehê komarê. Kemal Atatürk bi şoreşa kinc û alfabejê dixwaze ji şerqê bi dûr bikeve û xwe nêzîkî Ewrûpayê bike. Ew dixwaze komara wî bi şikil û celebê jiyana ewrûpiyan be. Ew vê yekê ne li ser tiştên kevin ava dike, lê tiştên kevin, kultur û awayê kevin ji bin ve hildiweşîne û dixwaze li gora xwe tişteki nû ava bike. Li gora xwe sekularîzmê dide pêş û dixwaze xwe nêzîkî medeniyeta Ewrûpayê bike.

Di îdeolojiyê weha teng de cih ji fikrên cihê, ji netewe û zimanên cihê re nedima. Loma, zimanê tirkî bû bingehê komarê û yê kurdî jî hate qedexekirin. Ew klasîkên ko bi zimanê kurdî lê bi alfabeja erebî hatibûn nivîsandin, qedexe nebûbin jî, êdî xwendin û têgihîştina wan ji bo nivîşê nû zehmet bû û di dema nû de jî, yanî bi kurdiya latînî tişteki nehat nivîsandin. Ji bo helandina kurdan qedexekirina zimanê wan nixteya herî girîng û heyatî bû. Ji aliyê din ve ji bo nûkirin û pêşdexistina zimanê tirkî desthilatdariya Kemalîzê gelekî dixebitî, bi xurtî dest bi wergerandina berhemên edebî kirin. Di wê demê de gelek berhemên fransîz û rûsan hatin wergerandin û bi riya wergerandina berhemên van zimanan êdî şêwe û awayên nû yên edebiyatê jî bi riya wergerê diketin zimanê tirkî. Ji xwe hunera çîroka tirkî jî wê demê dest pê dike. Piştî komarê (1923) di zimanê tirkî de gelek çîroknivîs derdikevin û bêtir di vê demê de hunera çîrokê li ba tirkan dikemile. Yê mîna Ömer Seyfettin, Sabahattin Ali, Sait Faik ko hê jî cihekî wan ê taybetî di edebiyata tirkî de heye, piştî komarê hunera kurteçîrokê li ba tirkan gihandine dereceyê bilind. Di demeke ko jinûvevejinek di edebiyata tirkî de çêdibû, kaniya edebiyata kurdî jî dimiçiqî, dawî li klasîkan dihat û bi her awayî rê li ber avakirina

edebiyateke kurdî ya nûjen hatibû girtin. Êdî derxistin û weşandina kovarên mîna Kurdistan (1898), Rojî Kurd (1913) û Jîn (1918-1919) ne mimkin bû. Herçiqas ev kovar û rojnameyên kurdan bi du zimanî, bi tirkî-kurdî bûn û giraniya wan siyasî bûn jî, dîsa li ser kultur û edebiyata kurdî, li ser rabûn û rûniştina kurdan gelek nivîsên balkêş diweşandin.

Heke ew bêdengî welê dewam bikira û bêbersiv bimaya, bi texmîniyeke mezin me ê îro nikarîba behsa çîroka kurdî ya nûjen bikira. Di warê kurmancî de ev bersiv ji du aliyan hat. Yek jê ji kurdên Sovyeta berê, bi riya radyo û weşanê hat, ya din jî ji aliyê ekola Hawarê ve hat.

Kovarên Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945), Roja nû (1943-1946) û çîroka kurdî

Ez dikarim bi hêsanî bibêjim ko ji bo edebiyata tirkî, ji bo ji nû ve vejîna edebiyata tirkî û avêtina bingehê edebiyata tirkî ya modern rola komara Tirkiyê çî bû, ji bo edebiyata kurdî jî rola kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû her ew bû.

Ev kovarên kurdî yên ko ji aliyê herdu birayan Celadet û Kamran Alî Bedir-Xan li Şam û Bêrûdê derdiketin, hem ji bo edebiyata kurdî ya nûjen bûn bingeh û dibistanek, hem jî di navbera edebiyata kurdî ya klasîk û nûjen de rola pirekê lîstin. Cara pêşî bi riya van kovaran û bi taybetî jî bi riya Hawarê, bi alfabeya latînî nimûneyên ji edebiyata klasîk gihîştin nivîşê me. Ferqa di navbera komara Tirkiyê û ekola Hawarê de ew bû, ko tirkan dixwestin her tiştî ji nû ve dest pê bikin, pehînekê li tiştên kevin bixin, lê ekola Hawarê edebiyata kurdî ya klasîk dikir bingehê û dixwest li ser wî bingehê qewînê esasê edebiyata nûjen biavêje. Li gora hewcedarî û pêwîstiya edebiyata nûjen û pêşketina civakê, di serî de Celadet dest bi nûkirina zimanê kurdî kir, dest bi bikaranîna hin termên kurdî yên nû kir û termên gramerî bi kurdî bi kar anîn. Kovara Hawarê ya ko ne li ser erda xwe û piştî hemû serîhildan û têkçûnên kurdan derdiket, rola dewletekê,

di dewleteke demokratîk de rola wezareteke çandî, rola akademiyeke zanistî dilîst. Loma, karê wê pir bû û karekî pir zehmet bû. Diviya bû zimanê kurdî bi tenê di klasîkan de nemaya, tenê ne zimanê folklorê bûya; pê edebiyateke modern bihata nivîsandin, pê her beşên edebiyatê û her awayên nivîsê bihata ceribandin.

Bi rastî jî welê kirin. Gava mirov niha çavekî li Hawarê digerîne, mirov pêrgî her beşê edebiyatê tê. Lê ji nav beşên edebiyatê, hunera çîrokê jî pir derdikeve pêş. Di kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû de bi dehan kesan çîrok nivîsandine. Hin kesan bi tenê çîrokek nivîsandine, hinan du çîrok û hinan jî çend çîrok nivîsandine. Lê belê hinan heta heft-heşt çîrokan jî nivîsandine. Digel wê jî dîsa navên wan wek çîroknivîs nayên bi bîranîn. Yê hinan ji ber piralîbûna xwe wek çîroknivîs derneketin pêş û deng nedan. Ew ji şaxekî bêtir bi karên nivîsê daketine; helbest, nivîsên civakî û siyasî û li ser dîrokê nivîsandine, bi xwe endamên partiyên siyasî bûne, birêvebir bûne; yanî wan xwe tenê bi warekî ve girê nedabûn. Loma, navên wan di dîrokê de carina wek kesên siyasî derdikevin hemberî me, carina wek helbestvan, carina wek zimanzan, carinan wek dîrokvîs, carina jî wek çîroknivîs derdikevin pêşberî me.

Li gora bendeke Ferhad Pîrbal ko di Nûdem, hejmar 11, 1994an de hatiye weşandin, Celadet Bedir-Xan di Hawarê de 12 çîrok, Osman Sebrî 7 çîrok, Mistefa Ehmed Botî 6 çîrok, Bişarê Segman 4 çîrok weşandine. Pîrbal di nivîsa xwe de hejmara çîrokên ko di Hawarê de hatine weşandin digihîne 69an. Herweha şeş çîrok jî werger û adaptasiyon in.

Di kovara Ronahiyê de jî 41 çîrokên hunerî, 29 çîrokên kurmancî, 3 çîrçîrok û 10 çîrokên werger hatine weşandin. Di kovara Roja Nû ya ko di bin berpirsiyariya Kamran Bedir-Xan de derdiket, 19 çîrokên hunerî û 10 jî çîrokên kurmancî hatine weşandin.

Gava em çîrokên van hersê kovaran didin ser hev, em dibînin ko hejmara wan bi ser sedî dikeve. Ji van çîrokan hejmareke mezin çîrokên hunerî ne, ji aliyê navên cihê ve hatine nivîsandin, lê piraniya nivîskarên wan anonîm in, li ser wan û jiana wan tiştêk di destên me tune, em nizanin ew kî ne, ji ko ne, çî kirine. Loma, gava mirov ji van çîrokan dixwîne, ji bilî navên nas, mirov ji Celadet Bedir-Xan şikê dike. Wê welê be jî, gelek ji wan navên nenas wê naznavê Celadet Bedir-Xan bin.

Di van hersê kovarên herdu birayan de, ji bilî çîrokên hunerî, gelek çîrokên kurmancî, çîrçîrok û çîrokên wergerê hene. Çîrokênwerger piranî ji edebiyata fransî ne, çîrçîrok û çîrokên kurmancî jî bi giranî ji herêma Mêrdînê ne.

Lê digel vê hejmara mezin ya çîrokan, dîsa gava behsa dema Hawarê an jî behsa çîroknivîsên Hawarê dibe, tavilê du nav têne bîra mirov. Ew jî Qedrî Can û Nûredîn Zaza ye...

Qedrî Can ((1911-1972) û Nûredîn Zaza (1919-1988)

Qedrî Can û Nûredîn Zaza hem du çîroknivîsên Hawarê yên li pêş bûn, hem jî du pêşengên çîroknivîskariya kurdî yên nûjen in. Digel ko ew jî piralî bûn, ew jî bi gelek tiştan ve mijûl dibûn, lê dîsa di mijûliya wan ya sereke de çîrok li pêş bûn. Ev herdu çîroknivîsên kurd jî ji ber sebebên siyasî ji bakurê welêt daketibûn Sûriyê. Qedrî Can ji Dêrika Çiyayê Mazî û Nûredîn Zaza jî Madenê bû.

Hejmara çîrokên Qedrî Can ji yên Nûredîn Zaza bêtir in û mijarên wan jî cihêtir in. Digel ko Qedrî Can di navenda siyasetê de bû û di piraniya helbestên xwe de jî mijara siyasî kiriye navend, û digel ko piraniya berhemên edebî yên Hawar, Ronahî û Roja Nû bi naverokeke siyasî dagirtî bûn û piranî li ser bûyerên rojane ên siyasî bûn, mijarên çîrokên Qedrî Can ne welê ne. Heta ji Qedrî Can hatiye wî xwestiye ew kirasekî edebî yê herheyî li çîrokên xwe bike, edebiyatê neke qurbana bûyerên

rojane, lê di eynî demê de, motîvên bijarte yê civata kurdî hîlbijêre û bi pîvanên edebiyatê yê gerdûnî bihûne. Qedrî Can ji bilî tibabek helbest û wergera kitêba Grigori Petrof ya bi navê »Di welatê zembeqê gewir de« ko beş bi beş di kovara Roja Nû (1943) de weşandibû, li ser hev di hersê kovarên navborî de ev her donzdeh çîrok weşandine; Hawar hebe gazî li dû ye, Gundê nûava, Besreka zêrîn, Hêva çardeşevî, Sond, Guneh, Sehên zozanan, Gulçîn, Nêçîra berazan, Serencam, Muhra Silêman û Roviye xapînok.

Hin ji çîrokên destpêkê pir kurt bûn, digel ko zêde dirûvê çîrokan bi wan nediketî jî, dîsa ew bi zimanekî edebî û hunerî hatibûn nivîsandin. Lê piraniya çîrokên Qedrî Can çîrokên hunerî ne, bi zimanekî hunerî û edebî hatine hûnandin, ew serdestê mijarên xwe ye, bi bêhnfirehî pê de diçe, karakteran û bûyerên ko li der û dora karakteran diqewimin baş salix dide, îro dijî, li doh difikire, doh bi sibehê ve girê dide. Ji ber ko Qedrî Can nivîskarê surgunê ye mirov tesîr û psîkolojiya surgunê di çîrokên wî de baş dibîne. Ew metoda flash-back bi kar tîne, gelek caran ji dema niha diçe salên zaroktiyê, mijarê li ser bûyereke an jî bîranînekê ava dike û dîsa ji nişka ve li xwe vedigere. Her çîrokek perçeyek ji jiyana Qedrî Can e, pelek ji kitêba jiyana wî ya qetyayî ne. Qedrî Canê perçebûyî dixwaze bi riya nivîsandina van perçeyên jiyana xwe, yekparetiya xwe bi dest bixe, rûpelên rengîn ko ji kitêba jiyana wî hatine qetandin bi ser hev de bîne. Ew di çîroka bi navê »Ser encam« (Roja Nû, 14-4-1943) de weha dest pê dike: »Gava mirov ji halê xwe ne razî, û ji pêşiya xwe bigûman be, dizîvire, li rojên xwe ên derbasbûyî dinere... mîna pîrên riziyayî ko ne ji dixwazin bimirin...tenê û tenê li rojên xwe yê çûyî bifikirin; xortaniya xwe, zarotiya xwe bînin bîra xwe û bi vî awayî bîna xwe biderxin...

Ez jî wisan bûme; ez jî bûme xortekî pîr. Li pêşiya xwe dinêrim: leylan û gûman... Li dora xwe mêze dikim: mij û dûman!...

Belê, ez jî mîna wan kal û pîrên xurde, rojên xwe ên derbas bûyî, nemaze rojên zarotiyê tînim bîra xwe, bi hezar û yek hesretî dilê xwe tije dikim û ji wan lezeteke derûnî distînim... Ew pelên ko ji kitêba jiyîna min hatine çirandin, îro perçên wan î rizyayî berev dikim, bi hev dizeliqînim... Dixwazim ji wan kitêba bextiyariyê çêbikim. Sond... Guneh... Rojên derbasbûyî... Serencam... her yek ji van, ji kitêba jiyana min a hezîn rûpelekî rengîn in. Lê rengîn dibin, zengîn dibin... dîsa pelinin çiriyayî û riziyayî ne... Serencam jî rûpelek ji wan pelan e...

Berî bîst û pênc salan bû...»

Qedrî Can di çîrokên bi navê «Sond», »Guneh« û »Rojên derbasbûyî« de, mîna çîroka »Serencam« destpêkeke şiroveyê tîne û li doh, li salên zaroktiya xwe vedigere û tîne bi roja îro ve girê dide. Gava mirov van herçar çîrokan li dû hev dixwîne, mirov dibîne ko Qedrî Can mijarên xwe bi zanebûn hilbijartine, li ser wan hûr bûye, pevgerêdanek di navbera wan de ava kiriye û hewl daye ko yekparetiyê pêk bîne.

Nûredîn Zazayê ko ji aliyê Celadet Bedir-Xan ve wek Çexovê kurd dihat bi nav kirin, di warê nivîsandina çîrokê û hunera çîrokê de şareza bû. Hemû çîrokên Nûredîn Zaza yên ko li ber destên me hene û yên ko me di nav weşanên Nûdemê de bi navê »Keskesor« wek kitêb weşandiye, ev in: Xurşîd, Derketî, Gulê, Keskesor, Stêrk, Perîşanî, Hevîna Perîxanê û Şerê Mêşan.

Di mijarên çîrokên Nûredîn Zaza de şopên nostaljiyê, hisa dûrbûna ji welêt û agirê xerîbiyê serdest e. Heke em adaptasiyonên Nûredîn Zaza yên romantîk nehesibînin, hemû çîrokên wî bi rewşa welêt ya siyasî ve girêdayî ne, bi motîvên welatparêziyê ve mişt in, bi têkoşerî, şîret û perwerdeya kurdan ve dagirtî ne, lê zimanê wî xweş û herihbar e, taswîrên wî xurt û zindî ne.

Kurdên Sovyeta berê

Kurdên Sovyeta berê, kurdên Qafqasyayê, an jî kurdên ko ji ber zilma, bi gotina wan »Roma reş« baz dane û li kujekî Ermenistanê, li bin pala çiyayê Agiriyê bi cih bûne, piştî şerê cîhanê ê yekem û piştî şoreşa Bolşevîkan ew di nav tixûbên Sovyetê de man. Herçiqaş kurdên misilman di nav wan de hebûn jî, piraniya wan kurdên êzîdî bûn, ew jî bi qirkirina ermeniyan re dihatin qirkirin. Lê, piştî şoreşê, piştî ko gelek komar û gelên Sovyetê gihîştin mafên xwe yên gelî, ew imkan kete destên kurdên Sovyetê jî, wan dest bi weşandina rojnameya »Rya Teze« kirin, li Yerîvanê radyo avakirin û dest bi nivîsandina helbest, çîrok, roman û piyesan kirin. Digel ko ew ji Kurdistana mezin qutbûyî bûn û bi tu awayî têkilî di navbera wan û kurdên Kurdistanê de nemabû, dîsa wan di nav xwe de zimanekî standart ava kiribûn û gava li Tirkiyê kurd ketibûn ber pêla asîmîlasyonê, wan bingehê jiyaneke edebî diavêtin.

Kurdên Sovyeta berê hema bêje hemû şaxên edebiyatê ceribandine. Berhevkin û weşandina berhemên folklorî jî li ba kurdên Sovyetê cihê girîng digirt. Lê wek şaxekî edebî kurteçîroka hunerî jî li Sovyeta berê hatiye nivîsandin. Wê ji bilî van nivîskar û çîroknivîsên ko me di vê antolojiyê de civandine jî çîroknivîs hebin, lê mixabin, me nikarîbû em xwe bigihînin berhemên wan, an jî li gora lîsteya ko me ji şarezayên edebiyata kurdên Sovyeta berê Tosinê Reşît, Têmûrê Xelîl û Wezîrê Eşo wergirtiye, çîroknivîs bi giştî ev in. Lê heke ne bi tenê ev bin jî, ev resimekî çîroka kurdên Sovyeta berê bi giştî didin.

Ji xwe gava behsa edebiyata kurdên Sovyeta berê dibe tavlê navê Erebe Şemo û roman wî »Şivanê kurd« tê bîra mirov. Ji bilî Erebe Şemo bi dehan kurdên Sovyeta berê xwe li nivîsandina edebiyatê, xwe li nivîsandina şaxên edebiyatê yên cihê ceribandine, di nav xwe de zimanekî kurdî ê standart ava kirine û bûne perçeyek ji edebiyata Sovyetê. Temayên ko nivîskarên kurdên Sovyeta berê di berhemên xwe de bi kar anîne, jiyana

gundîtiyê, adetên kevin, jiyana bi xelkên din re û nostaljiya welatê bav û kalan e. Di çîrokên ko me ji bo vê antolojiyê jî hîlbijartine kê m zêde ev tema serdest in. Bi alfabetîk ev çîroknivîs in: Babayê Keleş (1947), Eliyê Ebdilrehman (1920), Emerîkê Serdar (1935), Ere bê Şemo (1897-1978), Eskerê Boyîk (1941), Rizaliyê Reşîd (1929), Sîma Semend (1933), Têmûrê Xelîl (1949), Şemsî (1933-2002), Tosinê Reşît (1941), Wezîrê Eşo (1934) û Xelîlê Çaçan (1924).

Başûrê Kurdistanê

Li gora Ferhad Shakely ko çavkaniya xwe ji Husên Arif girtiye, çîroka soranî ya pêşî di sala 1925an de hatiye weşandin. Ev çîroka bi navê »Le xewma« ji aliyê Cemîl Saîb (1887-1951) ve hatiye nivîsandin. Ev çîroka Cemîl Saîb mîna 23 beşan di kovarên bi navê Jiyanawa û Jiyan de hatiye weşandin.

Lê çîroka kurdî ya başûrê welêt jî bi riya kovaran û bi taybetî jî bi derketina kovara Gelawêjê (1939-1949) ber bi dema xwe ya kemilandinê ve diçe. Di Gelawêjê de digel çîrokên nivîskarên kurd gelek çîrokên werger jî hatine weşandin.

Bi gotineke din rola kovarên Hawar, Ronahî û Roja Nû di pêşdexistina edebiyata kurdî û bi taybetî jî di pêşdexistina çîroka kurmancî de çî be, rola kovara Gelawêjê jî ji bo kurmanciya jêr (soranî) ew e. Kovara Gelawêjê di sala 1939an de dest bi weşanê kir û heta sala 1949an dewam kir. Ev kovara ko pêşî di bin berpirsiyariya Îbrahîm Ehmed de û dû re di bin berpirsiyariya Elaeddîn Secadî de derdiket, çîrokên Îbrahîm Ehmed û Elaeddîn Secadî jî tê de, li gora çavkaniya ko Ferhad Shakely di kitêba xwe ya bi navê »hunera çîroka kurdî ya nûjen« de daye û eynî çavkanî ji Husên Arif girtiye, di pêvajoya deh salên Gelawajê de 114 çîrok hatine weşandin. Ji van 114 çîrokan 82 werger in û 32 çîrok jî ji aliyê çîroknivîsên kurd ve hatine nivîsandin. Çawa ko gava navên çîroknivîsên Hawarê tê ser zimên

tavilê Qedrî Can û Nûredîn Zaza tên bîra mirov, çîroknivîsên Gelawêjê jî di serî de Îbrahîm Ehmed, Elaeddîn Secadî ((1915-1948) û Şakir Fetah (1914-1988) tên bîra mirov.

Me ji ekola Gelawêjê wek nimûne bi tenê Elaeddîn Secadî hilbijart û çîroka wî »Bo xatirê jinê« ji kurmanciya jêr wergerand kurmanciya jor.

Lê ferqa Hawar û Gelawêjê ev e; gava Hawarê dawî li jiyana xwe anî, di warê ziman û edebiyata kurdî de jî qutbûn û bêdengiyek çêbû û hema bêje vê qutbûn û bêdengiyê heta salên 80yê dewam kir. Lê gava Gelawêjê di sala 1949an de dawî li jiyana xwe anî, dîsa di edebiyata kurdî de berdewamiyek hebû. Ji ber ko zimanê kurdî ne qedexe bû û ew zilma nedîtî ya ko li Tirkiyê li ser zimanê kurdî hebû, li Iraqê û Kurdistana Iraqê tunebû. Erê Sedam kurd qir dikirin, lê zimanê wan qedexe nekiribû û di bin desthilatdariya Sedam de li Bexdayê Akademiya kurdî hebû. Loma, piştî rawestandina kovara Gelawêjê, demeke zêde neket navê ko hêdî hêdî di warê çîroknivîskariya kurdî de navên nû derketin. Ev navên ko derketin herçiqas bi stîl û awayên cihê derketibin jî, lê dîsa li ser mîraseke heyî edebiyata xwe ava kirin. Me ji bo vê antolojiyê jî nimûneyên berbiçav ji vî nivîşî hilbijartin û çîrokên wan ji kurmanciya jêr wergerandin ya jor. Lê, ji ber ko ez bi xwe ne şarezayê vî zaravayê kurdî me û bi qasî ko haya min ji edebiyata kurmanciya jor û prosesa wê heye, ez ew çend ji edebiyata ko bi zaravê kurmanciya jêr tê nivîsandin ne haydar im, min ji bo hilbijartina çîrokên wan, ji hin hevalan daxwza alîkariyê kir. Min ji Ferhad Shakely, Enwer Qadir, Heme Seîd Hesên û Mahabad Qeredaxî ev daxwaz kir. Lê ji bilî çîrokek du çîrokên ko Heme Seîd Hesên ji min re şandin, piraniya çîrokên kurmanciya jêr, yê ko me xistine vê antolojiyê min ji ba Ferhad Shakely peyda kirine û bi hilbijartina wî bûne.

Piştî ko min kurmanciya van çîrokan xwend, ez têgihîştim ko bi rastî jî hunera kurteçîrokê di vî zaravî de bi pêş ketiye, nivîskaran xwe li stîlên

cihê rakişandine û hewl dane ko pîvaneke çîroknivîsiya gerdûnî bi dest bixin. Ez bawer dikim, piştî ko hûn jî van çîrokan bixwînin hûn ê hewldayîna wan baş bibînin.

Bo nimûne, çîroka Husên Arif »Rêwîtiyeke efsûnî« li dû teknîkeke nû ye, di eynî çîrokê de demên cihê bi kar anîne, ew dem di hundirê hev de hûnane, carina serê xwendevên tevlihev dike, têgihîştina mijarê an jî mesajê zehmettir dike, hewayeke Joycewarî ava dike. Ev awayê nivîsandinê li ba çend çîroknivîsên din jî hene.

Ji bilî Elaeddîn Secadî û Husên Arif me çîrokên van çîroknivîsan ji bo vê antolojiyê hilbijartine: Ehmed Mehemed Îsmâîl (1943), Ferhad Pîrbal (1961), Ferhad Shakely (1951), Mahabad Qeredaxî (1966), Mehemed Mewlûd 'Mem' (1927-1987), Necîbe Ehmed (1954), Raûf Bêgerd (1942), Şêzad Hesên (1951), Mehemed Mukrî (1949?) û Mehemed Ferîq Hesên (1941).

Me ji bilî van navan çîrokên çend çîroknivîsên din jî amade kiribûn, lê mixabin pirsgirêka wergerê derket û loma ew çîrok negihîştin ser vê antolojiyê.

Behdîna

Gava mirov edebiyata kurmancên Behdîna dide ber ya soranî, mirov dibîne ko ew bi qasî ya soranî bi pêş neketiye. Ji xwe di salên ko edebiyata kurmanciya jêr (soranî) di dema xwe ya gulvedanê de bû, li ba kurdên Behdîna nesir an nedihat nivîsandin an jî pir kêr dihat nivîsandin. Ji ber ko di salên 1970-74an de li başûrê Kurdistanê zaravayê soranî di dibistanan de dihat xwendin, behdîniyan jî di dibistanan de kurdiya soranî dixwendin. Zimanê kurdî yê fermî soranî bû û behdîniyan jî di dibistanan de soranî dixwendin. Faktoreke din jî ew bû ko hem ji aliyê nifûsê ve behdînî (kurmanc) kêr bûn, hem jî edebiyat bêtir li bajarên mezin mîna Kerkûk, Silêmanî û Hewlêrê geş dibû. Lê dîsa jî, kurmancên

başûr di warê nivîsê de kê neman, gelek kesan helbest û çîrok nivîsandine. Tevgera edebî ya Behdînan, an jî ya kurmancên başûr piştî ya soranî tê, lê dû re wê temam dike.

Kurmancên başûr, digel helbesê, di warê çîrokê de jî gelek berhem dane. »Antolojiya çîroka nû ya kurmancên başûr« ko Xelîl Duhokî amade kiribû û me ew di sala 1995an de di nav weşanên Nûdemê de derxistibû, nimûneyeke berbiçav ya çîrokên wê herêma Kurdistanê ye. Di vê antolojiyê de Xelîl Duhokî 25 çîroknivîs civandine. Gelek ji van xwediyan kitêbên çîrokan in, hinan jî bi tenê çîrokên xwe di kovar û rojnameyan de weşandine. Li gora çavkaniya ko Xelîl Duhokî di pêşgotina antolojiya xwe de dide, çîroka pêşî li devera Behdînan ji aliyê Salih Rişdî de di sala 1960î de hatiye weşandin. Ev çîrok di kovara Ronahî de (Hafiz Qazî derdixist) hatiye weşandin. Li gora ko Xelîl Duhokî di pêşgotina antolojiya xwe de salix daye, kitêba kurteçîrokan ya pêşî ko li Behdîna derketiye, kitêba Elî Neqşebendî ye ko di sala 1972an de derketiye. Di sala 1979an de jî kitêba Îbrahîm Selman hatiye weşandin.

Mixabin, me nikarîbû ko em hemû çîroknivîsên kurmancên başûrê welêt têxin vê antolojiyê, lê me bi tenê çend nimûne hilbijartin. Ew nimûneyên ko me ji kurmancên başûr hilbijartine û xistine antolojiyê, ev in: Enwer Mehemed Tahir (1949), Fazil Umer (1962), Hesenê Silêvanî (1957), Husein Muhammed (1980), Nizar Mehemed Seîd (1952), Serfiraz Neqşebendî (1952), Sidqiyê Hîrorî (1956) û Xelîl Duhokî (1951).

Çîroknivîsên ko di vê antolojiyê cih negirtine, ne ji ber qelsiya çîrokên xwe cih negirtine; yek jê ji ber nebûna cih, ya din jî ji ber ko hema bêje hemû çîrokên Behdînan bi devoka behdînî hatine nivîsandin û ji bo xwendevanên zimanê kurdî bi giştî têgihîştina wan ne hêsan e. Herçiqas min xwest ez bi riya serastkirina zimanê wan, wan nêzîkî kurmanciya

standart bikim jî, lê ji ber rîska xerabkirina form û teknîka çîrokê min cesaret nekir.

Kurdistana Îranê

Ji ber ko min navên zêde çîroknivîsên Kurdistana Îranê bi dest nexistin, loma ez ê nikaribim zêde tiştekî li ser edebiyat an jî çîroka vî beşê welêt bibêjim. Lê em zanin ko di dema avakirina komara kurdî ya Mahamadê (1946) de gelek kovar û rojname derketin, lê mixabin ew jî mîna komarê temenkurt bûn. Lî vî beşê welêt, di warê prosayê de du navên naskirî; Hesenê Qizilcî (1914-...?) û Rehîmê Qazî (1925-1991) hene. Me di sala 1977an de romana Rehîmê Qazî ya bi navê »Pêşmerge« bi kurmanciya Elîşêr weşand û kitêba kurteçîrokan ya Hesenê Qizilcî jî bi navê »Kenê Parsek« bi kurmanciya Şikriya Salih û Firat Kelehkî di sala 2001ê de li Stenbolê di nav weşanên Avestayê de derket.

Ev herdu nivîskarên kurd di warê prosayê de zîrek bûn û ji bo nivîşê li dû xwe jî bûne çavkaniya îlham û bixwebawerî yê. Hêmin Mukriyanî piştî ko Hesenê Qizilcî hem wek insan û malbat, hem jî wek nivîskar dipesinîne, li ser çîrokên wî jî van gotinan dibêje: »Pêlewanên çîrokên Qizilcî, qet yek ji wan jî ji xwendevanên kurd re xerîb nayên. Hemû ji çîn û tebeqeyên civaka kurd hilbijartine, karesatên jiyana wan bi kurdiyeke sade (zelal, petî) û bi zimanekî wisa nivîsiye û şirove kiriye ko kurdekî ne xwendevan, cahil jî têbigihê.

Xwendevan bi ciwanî têdigihe, Mamoste Qizilcî heya bi çî radeyê şarezayî, zanistî, psîkolojî ye û çawa giyanê pêlewanan nas kiriye û çûye kûriya dil û hinavên wan.

...Xwendevan di van çîrokên kurd de nimûneya jiyana derebegekî zalim (çekmerek), kevnebegekî barkêş î kewitî, şêxekî destbir, derwêşekî zergweşên, cotkarekî zilm lê hatî kirin, zirnokerekî zimandirêj, karbidestekî bertîlxwer û biyanî, bazirganekî sûttxwer (faîzxwer) û

temakar, casûsekî niştimanfiroş, jineke tenê ya bedbext û bêbeş a kurd...»

Romana Rehîmî Qazî »Pêşmerge« di warê romanê de li Kurdistana Îranê nimûneya pêşî ye. Ev romana ha cara pêşî di sala 1960î de li Êrîvanê, di sala 1962an de li Bexdayê û di sala 1977an de li Swêdê di nav weşanên Nûdemê de derket. Îzeddîn Mistefa Resûl bi kurtî li ser romana Pêşmerge weha dibêje: »Pêşmerge çîrokeke dirêj e, diçe dikeve nav wî baxê gulan yê bêhnxweş yê ko di baxçeyê edebiyata kurdî de vedane, yan jî destaneke taze ye bi kincekî nû yê hunerî ve, awayekî nû yê romannivîsiya bi çend qehremanan a mêrxasî û dilêriya gelê kurd dide xuyakirin.«

Em zanin ko li Kurdistana Îranê ji bilî van herdu navan, di warê prosayê de navên din jî hene, lê ew êdî mijara lêkolîneke taybetî ye û di çarçoveya pêşgotina vê antolojiyê de hilnayê.

Em dibînin ko hem li Kurdistana Iraqê hem jî li ya Îranê nesra kurdî bêtir bi kurmanciya jêr dest pê bûye û hatiye nivîsandin, lê dû re bi kurmanciya jor dest bi nivîsandina nesrê hatiye kirin. Ji wan yek jê Perwîz Cîhanî ye ko em wî ji kovara Sîrwe nas dikin. Perwîz Cîhanî gelek nivîsên bi kurmancî di Sîrweyê de weşandin, lê piştî ko derket Ewrûpayê, êdî bi çîrok û romanên xwe navê xwe da bihîstin.

Tevgera salên heftêyî û weşanên wan

Heke em kovar û rojnameyên Musa Anter, Canîp Yildirim, Edîp Karahan; yanî Şark Postasi, Ileri Yurt (1958) û Dicle-Firat (1962-63) nehesibînin, piştî avakirina komarê bêdengiyê mezin li Kurdistanê hukum dikir û zimanê kurdî li qeyd û merbendan ketibû. Herçiqas ev kovar jî bi armancên siyasî derdiketin û zimanê wan bi tirkî bû, dîsa carina di nav re cih didan kurdî û heta Edîp Karahan di kovara xwe (Dicle-Firat) de gelek çîrok jî nivîsandin. Çîrokên ko Karahan dinvîsandin bi tirkî bûn, lê wî her

tim bi zanebûn an gotinên kurdî tevî çîrokên xwe dikirin an jî di nav çîrokan de cih dida stranên kurdî. Karahan jî wek gelek kesên wê demê, ji ber nebûna nivîskaran navên cihê bi kar dianî û di bin navên cihê de dinivîsand. Di nav hemû çîrokan de wî bi tenê çîrokeke xwe (Heydo û Ferho) xwerû bi kurmancî nivîsandiye. Me ew çîroka wî ya bi kurdî û çîrokên wî yên tirkî jî dan hev û bi wergera Mustafa Aydoğan weke kitêb di sala 2001ê weşand.

Ji ber sebebên siyasî, sînorên qewîn yên ko di navbera kurdan de hatibûn kişandin û zarava û alfabyên cihê, ne haya tevgera kurdên bakurdê Kurdistanê yên pêncî û şêstî, ne jî haya tevgera kurdî ya salên heftêyan ji tevgera kurdî û entelektuelî ya kurdên Sovyeta berê, dema Hawarê û başûr û rojhilatê welêt hebû.

Tevgera kurdî ya salên heftêyî ya bakurê welêt ji tevgereke kulturî û edebî wêdetir wek tevgereke siyasî derket. Ew li dijî sîstem û desthilatdariya Tirkiyê dengê protestoyê bû û bi nêrîn û îdeolojiya çepîtiyê ve rapêçayî bû. Piştî avakirina komara Tirkiyê, cara pêşî bû ko kurd dibûn xwediye evqas kovar û rojname. Armanca hemû kovar û rojnameyên salên heftêyî, mîna yên salên pêncî û şêstî siyaseta bû û ew siyaseta jî bi tirkî dihat meşandin. Ji xwe imkanê kirina siyaseta ya bi kurdî qet tunebû û zimanê kurdî qaçax bû. Qaçax bû û cezayê wê qaçaxê jî giran bû. Kovar û rojnameyên ko bi tirkî dest bi weşana xwe kiribûn, gava nêzîkî li salên heştêyî dikir, êdî cih didan nivîsên bi kurdî jî û piraniya tiştên ko bi kurdî dihatin weşandin jî helbest bûn.

Gava di sala 1979an de kovara Tîrêjê dest bi weşana xwe kir, di kovarê de dîsa bi giranî helbest dihatin weşandin, lê kovarê cih dida şaxên edebiyatê yên din jî. Di kovarê de bi herdu zaravayên kurdî; kurmancî û zazakî nivîs hebûn û di nav van nivîsan de mirov êdî pêrgî çîrokan jî dihat. Çîrokên Rojen Barnas ko di bin naznavê Flît Totanî de diweşand çawa di

warê helbestê de Rojen Barnas bêdengiyek dişikand, di warê çîrokê de jî ew bêdengî dişikand. Barnas dabû dû şopa Hawarê. Rojen Barnas bi zimanekî mîzahî rewşa welêt ya civakî, siyasî û psîkolojî radixist ber çavan. Ew bêtir çîroknivîsekî bajarî bû. Lê di eynî salê de kitêba Mehmed Emîn Bozarslan ya bi navê Meyro (1979) jî derket. Bozarslan bêtir motîvên xwe ji jiyana gundiyan distand, di siya jiyana gundiyan de hem rabûn û rûniştina kurdan, urf û adetên wan, hem jî tirs û tesîra leşkerên tirkan dianî zimên.

Ji xwe hê kovara Tîrêjê û kitêba Bozarslan firsend nedîtibûn ko di nav xwendevanan de belav bibin, cûntaya leşkerî dest danî ser hukum û bi desthilatdariya leşkerî re ev berhem jî hatin qedexkirin û bi carekê ve ji navê rabûn.

Hatina cûntayê û derketina kurdan ya derveyî welêt

Dibe ko trajediyek be, lê min gelek caran gotiye ko hatine cûntaya leşkerî ji bo pêşdexistina zimanê kurdî û avakirina edebiyata kurdî ya modern bûye bingehek, bûye alîkariyek. Gava leşkeran dest danîn ser desthilatdariyê, hemû partiyên siyasê qedexe kirin, bi hezaran kurd û tirk girtin û ew di îşkenceyên nedîtî re derbas kirin. Yê hatin girtin, hatin girtin, lê yê ko xwe ji nav lepên leşkeran filitandin û firsenda derketina derveyî welêt dîtin, li derveyî welêt karên ko nêvcî hiştibûn birin serî û di vî karê nû de jî ziman, çand û edebiyat cihekî mezin û taybetî digirt. Bi avakirina komele, federasyon û enstîtuyan û bi riya weşanên wan mîna Berbang, Hêvî, Kurdistan Press, Roja nû, Armanc, Rewşen û hin kovar û rojnameyên din êdî çîrokên kurdî di nav rûpelên wan de hatin xuyakirin. Digel ko çîrokên kurdî dihatin nivîsandin jî, dîsa mirov nikare bibêje ko çîroknivîsandin wek huner li ba kurdan rûniştibû, an jî çîroknivîskarî wek karekî profesyonel di nav me de bi cih bûbû. Di wan salan de bi taybetî jî di kovar û rojnameyên ko me navên wan li jor hejmartin de gelek çîrok

hatin weşandin. Bi weşandina çîrokan re hêdî hêdî hezkirên çîrokan jî peyda bûn û herçiqas heta salên 1985an hê kitêbên çîrokan nehatibûn weşandin jî, lê dîsa navin derketin ko li ser nivîsandina çîrokê konsantre bûn û di nivîsandina çîrokê de jî berdewam bûn. Gava ez navên hin çîroknivîsên wan salan bi bîr bînim divê ez behsa Şahînê Bekirê Soreklî, Hesênê Metê, M. Alî K, Lokman Polat, Fewaz Husên û Ridwanê Alî bikim. Lê heta sala 1985an jî ev çîroknivîsên me ne xwedîkitêb bûn. Di sala 1985an de kitêbeke Torî ya bi navê »Qolinc« li Stockholmê derket, di sala 1986an de kitêbeke min bi navê »Girtî« derket û piştî avakirina weşanxaneyê Welat (1988-1995) kitêbên Hesênê Metê, M. Alî K., Ridwanê Alî û Fawaz Husên derketin. Ji aliyê din ve kitêbên Şahînê Bekirê Soreklî û Lokman Polat jî derketin. Di dîroka edebiyata kurmancî de, an jî ya rastî di dîroka edebiyata kurmancî ya serxet û binxetê de êdî çîroknivîsên kurd berî mirina xwe kitêbên xwe yê çîrokan didîtin. Ev yek jî nîşana bingehekî qewîn yê çîroknivîskariya kurdî bû. Êdî ev nivîskarên me bi çîroknivîs dihatin bi nav kirin û wan jî xwe di hunera kurteçîrokê de kûr dikirin. Hin ji van navan hê jî berdewam in, hejmara kitêbên hinan ji yekê zêdetir bûne, lê hin jî di kitêbekê de mane.

Piştî salên 1990î

Piştî sala 1990î hem li Ewrûpayê, hem li Sûriyê û hem jî li Tirkiyeyê liv û tevgereke baş di warê çapemenî û edebiyata kurdî de çêbû. Min di sala 1991ê de bingehekî kovara Nûdemê avêt û di bihara 1992an de hejmara Nûdemê ya yekê derket. Di eynî salê de li Stenbolê kovara Nûbihar û rojnameya Welat jî dest bi weşanê kirin. Paşê jî Jiyana Rewşen derket. Ev hersê weşan jî xwerû bi kurmanciya jor bûn. Nûdem kovareke bi temamî çandî, edebî û hunerî bû, Nûbihar kovareke çandî, lê bi ser bawermendên musulman ve bû û rojnameya Welat jî rojnameyeke siyasî bû. Lê ji bilî Nûdemê di van weşanên din de jî tibabek nivîsên edebî, şiroveyên kulturî

û çîrok hatin weşandin. Çîrokên herî pir di Nûdemê de hatin weşandin. Min bi zanebûn dixwest ez cih bidim hunera çîrokê, bikim ko bala xwendevan û nivîskarên kurd ji helbestê hebekî jî dagere ser çîrokê, loma min di her hejmareke Nûdemê de çîrokek, carina du çîrok, carina jî sê çîrok dihatin weşandin. Lê van kovarên piştî salên 1990î hem bal dikişandin ser zimanê kurdî hem jî di aktuelhiştina edebiyatê de roleke berbiçav dilîstin. Gelek roman û kitêbên çîrokan yên ko piştî 92an derketin, pêşî di Nûdemê de hatibûn weşandin. Di navbera salên 1992-2000î de Nûdemê gelek kitêbên çîrokan weşandin. Kitêbên çîrokan yên Nûredîn Zaza, Rojen Barnas, Hesenê Metê, F. Cewerî...

Di wan salan de weşanxaneyê Dozê jî hat sazîkirin, digel ko weşanxaneyê Dozê kitêbên kurdî jî diweşandin, lê wê giraniya xwe dabû weşandina kitêbên bi tirkî.

Weşanxaneyên ko piştî 1995an û ji salên 2000î û vir ve ava bûn, bêtir weşanxaneyên meyildarên kitêbên kurdî bûn. Deng, Avesta, Doz, Pêrî, Nûbihar, Weşanên Enstîtuya kurdî ya Stenbolê, Aram, Sî, Mîr... Hinan ji van weşanxaneyan bi tenê kitêbên kurdî weşandin, hinan jî hem yên kurdî hem jî yên tirkî weşandin. Weşanxaneyên herî pir kitêbên çîrokan weşandin, weşanxaneyên Avesta û Sîyê ne. Weşanxaneyê Avesta bêtir nivîskarên berê; yên li Ewrûpa, Kurdistana Sûrî, Iraq û Îranê gihandin xwendevanên kurmanç. Kitêbên Avesta yên çîrokan ko di destên me de hene, ev in; Hesenê Qizilcî, Kenê Parsek; Ferhad Pîrbal, Çolistan; Helîm Yûsiv, Jinên Qatê Bilind, Mirî ranazin, Mêrê Avis, Memê bê Zîn; Hesenê Metê, Epîlog, Smîrnoff; Fawaz Husên, Amîdabad; M. Alî. K., Mehkûm; Kamîran Haco, Kelevajî... Di vê navê de weşanxaneyê Avestayê kitêbin çîrokan jî ji tirkî wergerandin kurmançî. Kitêba Suzan Samanci, Bajarê Mirinê; ya Migirdîç Magrosyan, Li ba me li wan deran derxist.

Weşanxaneyaya Sîyê jî piranî meyla xwe berda ser nivîskarên ciwan an jî nivîskarên nû û wê jî di hundirê kurtedemekê de gelek kitêbên kurteçîrokan gihandin ber destên xwendevanên kurd. Çîroknivîsên ko Sîyê kitêbên wan ên çîrokan derxistin ev in: Yaqob Tilermenî, Êşbazî, Bermeqlûb; Dilawer Zeraq, Kakil; Sedat Yurtdaş, Xelat, Enwer Karahan, Şevbuhêrkên şevên xalî; Çiya Mazî, Mistek jîyan; Fewzî Bîlge, Jidilara; Roşan Lezgîn, li bin dara Bîşengê...

Hin weşanxaneyên din jî yek libin kitêbên çîrokan weşandine.

Piştî salên 1980 li derveyî welêt û piştî 1990 jî li hundirê welêt (bakurê Kurdistanê), di warê hunera kurteçîrokê de gavên pir baş hatin avêtin û navên balkêş derketin qada edebiyatê.

Li gora rêza alfabê çîroknivîsên bakurê welêt yên ko di vê antolojiyê de cih girtine, ev in: Abidin Parilti (1977), Adar Jîyan (1962), Bûbê Eser (1955), Çiya Mazî (1960), Dilawer Zeraq (1965), Dr. Cuwan Batû, Edîp Karahan (1930), Edîb Polat, Enwer Karahan (1962), Felat Dilgeş (1965), Fewzî Bîlge (1962), Fîrat Cewerî (1959), Fûad Temo, Hasan Kaya (1964), Hesenê Metê (1957), Hêvîdar Zana (1976), Îbrahîm Seydo Aydogan (1976), Lokman Polat (1956), Mahmûd Baksî (1944), M. Alî K. (1964), Mehemed Dehsiwar (1959), Mehmet Sanri (1967), Mustafa Aydogan (1957), Rojan Hazim, Rojen Barnas, Roşan Lezgîn (1964), Sedat Yurtdaş (1961), Serdar Roşan (1958), Serkan Birûsk (1969), Silêman Demir (1956), Suut Kiliç (1967), Suzan Samanci (1962), Evdile Koçer (1977), Torî, û Yaqob Tilermenî (1972).

Çîroknivîsên ekola Hawarê; Celadet Alî Bedir-Xan (1893), Kamran Bedir-Xan (1895), Nûredîn Zaza (1919), Osman Sebrî (1905) û Qedrî Can (1911) herçiqas ji Tirkiyê û bakurê Kurdistanê bin jî, lê wan çalakiyên xwe yên edebî li Şamê û biyanistanê dikirin. Loma, mirov dikare wan ne ji

perçeyekî welêt, lê Kurdistanî bihesibîne. Ev yek ji bo Mele Mehmûdê Beyazîdî (1797–1858) jî derbas dibe.

Çîroka kurdî ya binxetê

Rewşa çîroka kurdî ya li Sûriyê jî çî bigire di rewşa çîroka kurdî ya Tirkiyê de ye. Piştî salên 1990î di çîroknivîskariya kurdên binxetê de jî livek çêbû. Ev liv û tevgera ha pêşî bi riya kovarên kurdî mîna Gurzek Gul (1989-1991), Zanîn (1991-1997), Aso (1992-...?) û hin kovarên din û dû re çîroknivîsan çîrokên xwe ji kovar û rojnameyên ko li Stenbolê û Ewrûpayê derdiketin re şandin. Ji ber ko kurdên binxetê jî alfabeya latînî bi kar tînin, di bin tesîra Hawarê de û nêzîkî zimanê Hawarê dinivîsîn, di navbera wan û weşanên din ên ko bi kurmanciya latînî derdikevin de tu pirsgrêk dernakevin. Lê kurdên binxetê ji bilî ko wan çîrokên xwe di kovaran de didan weşandin, dest pê kirin çîrokên xwe gihandin hev û mîna kitêb weşandin. Hinan ji wan kitêbên xwe bi xwe derxistin, hinan jî kitêbên xwe di nav weşanên kurdî ên din derxistin.

Mîna nivîskarên kurd yên beşên din, gelek nivîskarên kurdên binxetê jî ji welatê xwe derketibûn û li derveyî welêt dijiyan. Çîroknivîsên ko ji refê pêşîn yên ko li derveyî welêt dijiyan mirov dikare navên Şahînê Bekirê Soreklî, Bavê Nazê, Fawaz Husên û Ridwanê Alî bide. Lê vê dawiyê hejmara wan zêdetir bû. Hejmara çîroknivîsên kurd ên binxetê jî zêdetir bûne. Çîroknivîsên vê antolojiyê bi alfabetîk, ev in; Cankurd (1948), Ebdilbaqî Huseynî (1961), Fawaz Husên (1953), Fewaz Ebdê (1961), Helîm Yûsiv (1967), Jan Dost (1965), Kamîran Haco (1959), Pîr Rustem (1963), Qado Şêrîn (1967), Ridwanê Alî (1959), Silêman Alî (1963) û Şahîn Bekirê Soreklî.

Çîroknivîskariya kurdî ya ko berê tenê di çarçoveya rûpelên kovar û rojnameyan de bi sînorkirî bû, di hundirê bîst salên dawî de hêdî hêdî gihîşt karaktereke xwe ya taybetî. Îro ne bi sedan be jî, bi dehan kitêbên

kurdî yê çîrokan li ber destên me hene. Ji aliyekî ve gava ji edebiyata dinyayê çîrok werdigerin kurdî, êdî deriyê çîroka kurdî jî li zimanên dinyayê vebûye û çî bi celebê yek û yek çîrokan be, çî bi wergera kitêban sihê be, çî jî bi celebê antolojiyan be êdî çîroka kurdî werdigere zimanên biyanî û rexneyên baş jî werdigerin. Ev beşa hunerî, ya ko hê berî zêdeyî sed û pêncî salî di zimanê kurdî de dest pê bûye, lê pir hêdî meşiyaye, gelek caran hilkimiye û ketiya, ez karim bê dudilî bibêjim ko êdî bi ser xwe ve tê û hêviyeke baş jî dide mirov..

Çîrok

Me navê vê antolojiyê kir »Antolojiya çîrokên kurdî«. Tê wê manê ko ez niha, di dema îro de, ji bo vî şeweyê hunerê gotina »çîrok" an jî mîna kurmancên jêr dibêjin »kurteçîrok« dipejirînim û loma min ev nav bi kar aniyê. Di kovar û rojnameyên mîna Hawar (1932-1943), Ronahî (1942-1945), Roja Nû (1943-1946), Hêviya Welêt (1963-1965), Çiya (1965-1970), Hêvî (1983-1992) û gelek kovarên kevin û nû de navê »çîrokê« hatiye bikaranîn. Heta di kovara Rojî Kurd (1913) de çîroka Fûad Temo ko heta niha mîna çîroka kurdî ya pêşî dihat qebûlkirin, di bin sernava »çîrok« de hatibû weşandin. Herçî kurdên Sovyeta berê ne, wan jî »çîrokê« wêdetir, gotina »serhatî« bi kar anîne. Gotina serhatî, çîrok, kurteçîrok, serpehatî, serbûrî her maneya »story« an jî »short story« a îngilîzî dide ko tê maneya çîroka me.

Digel vê jî, bi taybetî piştî salên 1990î, li ser hin kitêbên çîrokan, an jî di hin kovar û rojnameyan de ji berdêla »çîrok« gotina »novel« hat bi kar anîn û li ser vê gotinê carina devjengî çêdibin, ji bo vî şeweyê hunerê, an jî ji bo zimanê kurdî rastî û nerastiyê wê tê mînaqêşekirin.

Hunera çîrokê, bi qasî navê xwe, di warê naveroka xwe de jî her tim cih ji mînaqêşeyê re hiştiye. Di gelek zimanan de ji bo navê vî şeweyê nivîsê ne zelalî çêbûye, lê paşê, bi riya akademî û lingivîstan ev problem hatiye

çareserkin. Tirk berî komarê, demekê piştî komarê û heta niha jî gotina »hikaye« bi kar tînin. Lê piştî kampanyaya pakkirina zimanê tirkî, bi giştî meyildarên Kemalîzmê, ji berdêla gotina »hikaye«, gotina »öykü« bi kar anîn. Ev gotina dawî, ji bilî konservatîvên Tirkîyê îro ji aliyê piraniya tirkan ve tê bikaranîn.

Di zimanê swêdî de jî ev serêşî û gengaşî heta demekê hebû. Di swêdî de ji çîrokê re »novell« tê gotin. Nêzîkî naveroka »novell«ê »berättelse« û »historia« tê bi kar anîn. Lê »novel« bi îngilîzî »roman« e. Novela îngilîzî, yanî ya ko roman e bi 'l'yekê û ya swêdî ko »çîrok« e bi du 'll'eyan e. Li gora zimanên swêdî û îngilîzî bi lêvkirina wan jî cihê ye. Lê kurd bêtir bi celebê îngilîzî bi kar tînin, bi vî awayî çîrok ji maneya xwe derdikeve û maneya romanê werdigire. Ya din, ev gotin, ji bilî kesên ko li Swêdê dijîn, bi awayekî giştî ji aliyê xwendevanên kurd ve nayê zanîn. Loma, min maqûltir dît ko ez ji berdêla navê »Antolojiya novelên kurdî« navê »Antolojiya çîrokên kurdî« li vê antolojiyê bikim û hêvîdar im hûn ê jî vê kirina min maqûl bibînin.

Lê ev jî rastiyeke e ko gotina »çîrok« ji aliyê gelek kesan mîna »masal«a tirkî, an jî »saga«ya swêdî tê fêhmkirin. Li gelek deverên Kurdistanê kurd ji »masal«ê re jî dibêjin »çîrok«. Lê, li hin deveran jî gotina »çîrçîrok« heye ko ev gotin di kovara Hawarê de jî hatiye bi kar anîn. Herçiqas »çîrok« û »çîrçîrok« li hin deveran werin eynî maneyê, an jî mirov tu ferqê nexwe navbera van herdu terman, lê di jiyana rastî de ev bi awayekî zelal ji hev vediqetin. Di jiyana rojane de, di danûstandinên civakî de gotina »çîrok« di zimanê gel de pir tê bi kar anîn. Gava yek ji yekî re behsa jiyana xwe an jî behsa jiyana hinin din bike û yê ko jê re tê behs kirin hê jî bipirse, yê ko behs dike dibêje »çîroka wan dûr û dirêj e«, an jî »ev çîrok dirêj e«, an jî »ev çîrokeke dûdirêj e«.

Di vir de em dibînin ko gotina çîrok dibe serpêhatî, dibe serpêhatiya kesekî, du kesan, evînekê, xayîntiyekê, diziyekê, mêrxasiyekê, bûyerekê...

Ji xwe çîrok jî ev e; li ser van e, van tîne zimên. Lê van çawa tîne zimên, bi çi awayî bi lêv dike, çawa şirove û taswîr dike, kurtî û dirêjiya wê çawa ye, ev jî kêr zêde bi qasî navê wê li ser hatiye peyivandin. Çîrokên niv rûpel jî hene, yên heta dused rûpelî jî hene. Hin zanayên edebiyatê gotine, çîrok divê li dor deh rûpelan bin, hinan jî guh nedane kurtî û dirêjiya çîrokê. Ji xwe, me bi xwe jî di amadekirina vê antolojiyê de guh neda kurtî û dirêjiya çîrokan. Hin ji çîrokên vê antolojiyê zehf dirêj in, hin jî kurt in.

Edgar Allan Poeyê emerîkî (1809-1849) kurtbûn û dirêjbûna çîrokê bi dirêjiya dema xwendina wê ve girê dide. Li gora pîvana Poe divê dema xwendina çîrokekê ji nîvsaetê, heta saetekê an du saetan be. Lê ew di çîrokê de gotinên zêde red dike, konsentrasyonê dixwaze, gotineke ko di çîrokê de hatibe bi kar anîn lê dîrek an jî îndîrek têkiliya wê bi temaya çîrokê re tunebe, wê ji bo çîrokê qelsiyê mezin dibîne.

Bi vê tarîfa Poe ve girêdayî Çexovê (1860-1904) ko li dor 600 çîrokî nivîsandine û bi taswîreke psîkolojiyêke realîst mirovên ji sinif û kategoriyên cihê salix dide, weha dibêje: »Heke di çîrokekê de tivingek bi dardekirî be, berî ko çîrok xelas bibe divê ew tiving biteqe.«

Li ser naveroka çîrokê, li ser forma wê, li ser konsentrasyon û kompozisyona wê gelek tişt hatine gotin û nivîsandin.

Lê di derheqê hunera çîrokê de tarîfeke Çexov ya meşhûr heye, dibêje: »Çîrok nivîsek e, tu hinekî ji serî hinekî jî ji dawiya jê bikî wê bibe çîrok.« Di eslê xwe de Çexov dixwaze bi vê kurtetarîfa xwe ya di derheqê çîrokê de cih ji fantaziya xwendevanan re jî bihêle. Bi gotineke kurmancî, ew naxwaze ko nivîskar xwendevanê xwe ehmaq bihesibîne û jê re ta bi derziyê vebike

Yek ji bavên çîrokê, yê ko li gora gotina Gorkî edebiyata Rûsyayê ji bin »palto«yê wî derketiye, Gogol, li ser çîrokê welê dibêje: »Te divê bila dewlemed an feqîr be, bîrfireh an bîrteng be, çê an xerab e, alavê sereke yê ko divê nivîskar li ser hûr bibe, jiyana mirovên ji rêzê ne».

Çîrok mîna şaxekî edebiyatê pir ciwan e, ji romanê ciwantir e. Lê li gora hin fikiran jî, çîroka nenivîsandî xwediyê dîrokeke pir kevin e, dîroka çîroka devkî digihîje hezar salan. Gelek çîrokên kurdan ên devkî, çîrokên orientê, çîrokên hezar û şevekê nimûneyên destpêkê yên çîroka hunerî ne. Lê cara pêşî, florensiyekî nenas di salên 1300î de, berhevokek bi navê «Conto nouvelle», yanî «Sed çîrok», an jî «Sed nûçe» ko ji çîrok û serpêhatiyan pêk hatibû weşand. Paşê Boccaccio derket û bi «Decameron» terma çîrokê bêtir bi cih kir. Herçiqa di sedsala 17an de jî nivîsên bi forma çîrokê ji pênûsa fîlozofê fransîz Voltaire derketibin û li Îngiltereyê çîrokên tirsê û pîrebokan hatibin nivîsandin jî, dîsa mirov dikare bi hêsaniyê bibêje, ko temenê vê forma nivîsê kêmtir 200 salî ye û ji nav şaxên edebiyatê şaxa herî ciwan e.

Di pêvajoya dîrokê de gelek nivîskarên mîna Balzac, Tolstoy, Hugo û Hemingway çîrok nivîsandine, lê mîna çîroknivîs heta niha kesî cihên E. Allan Poe, A. Çexov û Guy de Maupassant negirtine.

Çîroka kurdî ya pêşî

Gava mirov dîroka hunera çîrokê li ber çavan digire û çîroka vê antolojiyê ya pêşî digihîne sala 1856an, rehetî û aramiyek bi mirov re çêdibe. Lê ez nikarim bibêjim ko hemû çîrokên vê antolojiyê li gora pîvanên çîroka hunerî ne. Di vê antolojiyê de çîrokên pir xurt, yên kêmtir xurt û yên lawaz hene. Ev antolojî ne antolojiyeke çîrokên bijarte, lê antolojiya çîrokên kurdî bi giştî ye.

Li gora rêza kurteçîrokên vê antolojiyê dîroka çîroka kurdî zêdeyî sed û şeşt salî ye. Berî bi sed û şeşt salî çîroka kurdî ya hunerî hatiye nivîsandin.

Heta niha dîroka çîroka kurdî di sala 1913an de û di çîroka Fûad Temo de asê dima. Li gora lêkolîneke Ferhad Pîrbal (Xelîl Duhokî gihand kurmanciya jor) dîroka çîroka kurdî ji ya Fûad Temo kevintir e û digihîje nîveka sedsala hijdehan. Ev çîrok jî ji aliyê Mele Mehmûdê Beyazîdî (1799-1867) ve hatiye nivîsandin. Mele Mehmûdê Beyazîdî di warê nesrê de gelek berhem li dû xwe hiştine. Hin ji berhemên Mele Mehmûdê Beyazîdî bi alîkariya A. Jaba ji windabûnê xelas bûne û gihîştine roja me. Yek ji berhemên M. M. Beyazîdî ko îro di destên me de ye, bi navê «Adetên kurdan» e. Ji bilî wê jî Beyazîdî Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî wergerandiye kurmançî û gelek çîrokên devkî derbasî nivîsê kirine.

Wek Beyazîdî bi xwe jî diyar dike, ew çîroka xwe li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî dihûne. Ehmedê Xanî jî şahesera xwe li ser bingehê çîroka folklorî »Memê Alan« ava kiribû. Belê, ew bûyera Mem û Zînê ji xwe re bingeh digire, lê bi uslûb û awayê xwe, bi wesf, pesin û taswîrên xwe çîroka xwe dihûne, bajarê Cizîrî, evîna Stî û Tacdîn û evîna Mem û Zînê salix dide. Herçiqas hin kêmasiyên hûnandina çîroka hunerî di çîroka »Çîroka Mem û Zîn«a Mele Mehmûdê Beyazîdî de diyar bibe jî, gava mirov dîroka nivîsandina çîrokê, rewşa zimanê kurdî û wek beşekî hunerî bi nêrîneke dîrokî lê dinere, mirov dikare bi hêsanî çîroka Beyazîdî wek destpêka çîroka kurdî ya hunerî bihesibîne, heftê salên din li temenê çîroka kurdî zêde bike û xwe bi vê yekî jî serbilind bihesibîne.

Lê her çiqas çîroka Mele Mehmûdê Beyazîdî »Çîroka Mem û Zînê« û ya Fûad Temo »Çîrok« an jî wek ko Mahmûd Lewendî navê »Şewêş« lê kiriye, wek çîrokên destpêkê werin hesibandin û dîroka çîroka miletekî bi çîrokên wan dest pê bibe jî, em dibînin ne Beyazîdî, ne jî Temo ji bilî her yekî çîrokekê, tu çîrokên wan di destên me de nînin. Ez bi xwe bawer dikim hem wê Mele Mehmûdê Beyazîdî hem jî Fûad Temo ji çîrokekê bêtir çîrok nivîsanibin. Ji ber ko di kovara Rojî Kurd de li dû çîroka Fûad

Temo, dûmahika vê çîrokê heye, hatiye nivîsandin. Lê em dûmahika çîrokê nabînin, Mele Mehmûdê Beyazîdî û Fûad Temo her yekê bi çîrokekê xwe digihînin dema me û bi vê yekê navê xwe di dîroka edebiyata kurdî de nemir dikin.

Dawî

Ez zanim ko ez bi amadekirina vê antolojiyê bi karekî cidî û karekî ko berpirsiyariyeke mezin jê re divê rabûme. Ez pê re pir westiyam jî; min xwest ev antolojî hem bibe temsîlkara çîroka kurdî, hem jî tu çîroknûsên kurd neyên jibîrkin. Hêvîdar im min tu çîroknûsên kurd ji bîr nekirine û wê ev antolojî jî bibe temsîlkara çîroka kurdî.

Min nexwest ez li ser her çîrokeke di antolojiyê de rawestim, behsa naveroka wan bikim û têkevim şiroveya stîl û temayên wan. Ez wê ji we re dihêlim. Piştî ko hûn bixwînin, hûn ê ji hinan hez bikin, wê kêfa we jî ji hinan re neyê. Edebiyata bedew welê ye, xwendina wê hilbijartinek e; hezkirina wê jî karekî îndîvîduel e. Bêguman, nivîsandin û afirandina edebiyata bedew jî karekî îndîvîduel e.

Heke min bixwesta ez bi tena serê xwe vî karî bikim û vê antolojiyê bi vî awayê berfireh amade bikim, min ê nikarîba û ez ê bi ser jî neketama. Loma, ez dixwazim spasiyên xwe ji wan kesan re bikim ko di amadekirina vê antolojiyê de ji min re bûn piştgir û alîkar.

Ez ji bo hilbijartin û peydakirina çîrokên bi kurmanciya jêr spasî Ferhad Shakely dikim; ji bo wergerandina çîrokên soranî bo kurmancî spasî Husein Muhhamed, Elîşêr, Mûrad Ciwan, Emîn Narozi, Elend Darvîn, Şikriya Salih û Firat Kelehkî dikim; ji bo nivîsandin û tîpguhêziya çîrokên kurdên Sovyeta berê spasî Têmûrê Xelîl dikim; ji bo tîpguhêziya ji alfabeya erebî jî spasî Xelîl Duhokî, Mahmûd Lewendî û Emîn Narozi dikim.

Firat Cewerî

Stockholm, 2003

Nivîskar: FIRAT CEWERÎ

Weşandin: 2005-06-29

Xwendin: 13801

**

ÇÎROKÊN RENGÎN

Lokman Polat

(Ji bo 50 salî)

Çîrokên Rengîn

Helwest Forlag

ISBN

: 91 - 89224 - 81 - 7

Edîtor : Fehîm Işık

Çap (Baski) : Ser Matbaacihk Çapa yekem: 2007 - Stenbol

Adres / Navnîşan Tensta Alle 43. 2tr. 16364 Spanga / Sweden

* * *

Taksim Cd. No: 71/5

80090 Beyoglu / Taksim-istanbul Tel: 0.212.2972505

Faks : 0.212.297 13 73

. lokmanpolat-l@hotmail.com

helwestforlag@hotmail.com

lokmanpolat2000@yahoo.se

(Dîzayna bergêû amadekariya weşanê ji alî Fehim Işık ve hatîye çêkirin)

Naverok

1 - Çîrokên Rengîn û Gotinên Nivîskaran 2 - Di Zîndanê de bi tenê bû

3 - Qanser

5 - Du Dilî

6 - Keça Elewî

7 - Îmam û Perwîz 8 - Jina Hefskirî

9 - Benda Çepên Tirkan Neseकिन! 10 - Serbilindî

Rûpel

5 - 18 19 - 21 22 - 26 27 - 36 37 - 40 41 - 53 54 - 63 64 - 68 69 -75

ÇIROKEN RENGIN

Temenê min bû 50 sal. Min li derveyê welêt, anku li Ewropayê gelek pirtûkên kurteçîrokan, roman û kurteroman weşand. Hinek pirtûkên min li Stenbolê jî hatin çapkirin û gihîştin destê xwendevanên kurd yên li welêt.

Lêbelê piraniya pirtûkên min li Ewropayê man û îmkanê min yê aborî tunebû ku ez wan carek din li Stenbolê biweşînim û bigîjînim destê xwendevanên welêt.

Min bi saya dostên xwe yên nivîskar û hinek xwende-vanên kurd ji her pirtûkeke xwe kurteçîrokeke helbijart û ez wan di yek pirtûkek de li Amedê diweşînim û pêşkêşê xwendevanên kurd yên li welêt dikim.

Ev pirtûka min ya hilbijartina kurteçîrokên min ji bo pêncî saliya min, diyariya min ya ji bo xwendevanan e. Ez hêvîdarim ku xwendevanên kurd van kurteçîrokan bi dilxweşî bixwînin,

Kîjan kurteçîrok ji kîjan pirtûkê min hatiye wergirtin û ew pirtûkê min di kîjan salî de hatiye weşandin, li dawiya kurteçîrokê hatiye nivîsîn.

Ji bo ku her kurteçîrokeke ji pirtûkek hatiye wergirtin û hemû kurteçîrokan bi tevahî ahengeke rengîn pêk aniye û her çîrok dîmenek ji rengê jiyanê nîşan dide, loma min jî navê pirtûkê kire kurteçîrokên rengîn.

Lokman Po/at / Amed - 2006

5

ÇEND GOTINEN NIVISKAREN KURD

Di derbarê pirtûkên kurteçîrokan yên Lokman Polat de Merheba mamoste,

Pirtûka Gulîzar ê hîna di nav destên min de ye, ez dixwînim.

Heta niha çîrokên pir xweş ku bi hestên tenik û bi . zimanekî şayîk û zelal hatine nivîsandin xwendine.

Destên te sax bin. Ji çîrokên te yên berê, di baweriya min de, xweştir û ji hêla teknîkî û hunerî de, bilindtirin.

Ew têtikiya hestyar ya di navbera jin û mêt de, di çîrokan de, bi awayekî pir nazik û bi hostayiyeke baş hatine hunandin.

Digel silavên ji dil.

Helîm Yusiv

Yên kitêbxana neçar a kurdî dewlemend dikin ... Yek ji nivîskarên kurdan ên nû ku bi berhemên xwe kitabxana neçar a kurdî dewlemend dikin, Lokman Polat e. Ez dizanim, diwariyên ku li ber nivîskariya Polat e, bêhejmar in. Di her warî de, bi her texlîdî. Ev diwarî û asteng ê, mixabin, kêm jî nebin, -eger roj bi roj hîn zêdetir nebin. Lê digel vê jî ew dinivîse û nivîskariyeke nû tîne pê. Kitab li pey kitab, ew bi zimanekî hêsan û rojane, derd û kulên kurdan diqulipîne ser vegotin û kurte-çîrokê.

Eger edebiyata kurdî ya nûjen ê piralî bibe û mîna keskesorê bi pir rengan bixemile, hingî ev celeb edebiyat ku Polat ava dike, girîng e. Ev celeb edebiyat jî renekî

6

sereke yê keskesorê ye.

Her nav, her xebat, her ked, her daxwaz, her berhem û her afirîna ku rengan tîne pê, wan dixemilîne, kitekitên wan vedibêje û yekitiya wan dineqîşîne, pîroz e.

Pîroz be Lokman Polat!

Mehmet Uzun

Pîrozbahiyek

Nivîsandina Lokman Polat tev weke serpêhatiyan hatiye nivîsandin. Ev rewş ne li cem me bi tenê, li cîhanê teva nivîsandina herî zor e. Çîrok weke ku heye tê lidarxistin. Avaniya wê jî li gorî bûyerê ye. Ev rewş ne hêsan e. Her nivîskar nikare ji bin derbikeve. Lê Lokman Polat bi nirxandin ji bin vî barî derketiye. Car din pîrozbahiyek ji teref min ...

Medenî Ferho

Lokman Polat, di kurteçîrokên xwe de rewşa Kurdistana berê, êşên jinan ku yên li ser evîn û xizaniyê û birakûjîyê bi gotinên şewat tîne tîne zimên.

Murat Ergîn

Nivîskarê rojnama Welat

Heger em bi temamî li naveroka hemû kurteçîrokên Lokman Polat binêrin, baş bifikirin, em dê bêne ser vê fikirê ku pirtûkên wî bi bîr û bawerîya xwe ve, bi merem û mebestên xwe ve parve dibin ser komên jêrîn:

7

1) kurteçîrokên li pêşberî xwefiroşan, muxbîr, sixur; 2) çîrokên li hemberî hovî û jakawîya faşîzmê; 3) kurte-çîrokên ronahîkirina şerê çekdarî û pêwîstbûna wî; 4) kur-teçîrokên li pêşberî çavnebarî, dextsî û fesadî; 5) kurte-çîrokên li ser hevaltî û hevrêtiya rasteqînî; 6) li ser fedakarî û xwekuştin ji bo xatirê serxwebûna Kurdistan û parastina karê rêxistinî; 7) kurteçîrokên evîndariyê, dildariyê, xerîbî, koçberî, wêrankirin û sirgûnê.

Z Şêxmûs

Rojnama Azadiya Welat - Hejmar 14

Berî niha pirtûkek bi navê "Jin û Zindan" di nav weşanên "Çanda Nûjen" de derket. Naveroka pirtûkê li ser şerê jina kurd a serxwebûn û azadiyê ye. Berxwedana wan a pir alî tîne zimên. Ji xwe nivîskarê berhemê Lokman Polat, ji bo bîranîna lehengiya wan ev pirtûk nivîsandiye.

Nivîskar Polat psîkolojiya Dayika Kurd pir alî derdixîne pêş û mirov li ser dayikên kurdan pir alî dibe xwedî dîtin.

Gabar Çiyan

Rojnama ROJ - Hejmar: 26

Edebiyat gihandinekî hişk nîn e; gihandinekî bi zanîn û xweşik e.

Lokman Polat nivîskarekî kurd e ku di vê demê de ji ber sedemên siyasî derketiye derveyê welêt û li Swêdê giraniya xebata xwe ya edebî daye ser nivîsîna kurteçîrokan. Lê di nav berhemên wî de hevpeyvîn, xebroşk, ro-

8

man û amadekirina hinek mijaran mirov dikare bibîne. Wî kovara Helwestê jî di wî welatî de derxistiye, lê demek şundaji bo ku weşandina kovara Helwest gihîştîyearmanca xwe, weşandina kovarê daye rawestandî.

Ji van pirtûkên Lokman Polat şeş heb li cem me (di he-pisxaneyê de) hene û me xwendîye.

Em bi saya Ereb Şemo devoka Kafkasyayê, bi saya Î.

Ahmed devoka başurê mezin û bi saya Lokman Polat devoka Amedê fêr dibin, dihewisin û lînêrîna xwe dewle-mend dikan.

- Bayê azadiyê - Çîrokên nivîskar Lokman Polat yê li ser têkoşîna bakurê welêt in. Di pirtûka Bayê Azadiyê de xuya dibe ku têkoşîna bakurê welêt li ser nivîskar tesîr kiriye. Her kurteçîrok wek belgeyek e. Rastiyê aniye zimên. Nivîskar li gor realîzma civakî kurteçîrokan hunandiye. Mirov di vê pirtûkê de mînakên zilma Komara Tirkiyê ya li ser kurdan dibîne. Di kurteçîroka "Li Benda Çepên Tirkan Nesekinin" de mirov rexneyên balkêş yê ku li çepên tirkan hatiye kirin dixwîne. Mirov di çîroka bi navê "Kurd Înadî" de jî tiştên balkêş dibîne. Naveroka vê pirtûkê gelek dewlemend e û mirov dikare vê pirtûkê ji bo zanîn û nasîna têkoşîna bakurê welêt wek destpêkek, wek pêngavek bibîne.

Divê mirov berhemên Lokman Polat yê edebî bixwîne û bi edebiyatê re têkiliyên xwe yê xurt dayne. Dema rexne û pesin di cîh de bê karanîn, me pêşve dixe. Rexne û pesin ji bo edebiyata me pêwîst e. Divê em hîn pirtir li ser van berhemên edebî binivîsin. Divê mirov li ser berhemên edebî nivîsên danasîn û analîzê binivîse û di kovarên kurdî de biweşîne, da ku xwendevanên din jî jê

9

sûd werbigrin.

Edebiyat gihandinekî hişk nîn e. Gihandinekî bi zanîn û xweşik e. Edebiyat şêrîn dike ku mirov jê nereve, wê şêrîniyê vexwe û carek din jî bixwaze. Dawî em vê bibêjin; di nirxandina pirtûkan de kêmaniyên me hene. Lê berhemên weha yê edebî dê hêj pir bêne nirxandin. Ev nivîs wek despêkek e.

Rêzan Tovjîn

Kovara Jîndan - Hejmar: 8 - Sala 2000

Serekanî û îlhama nivîskar rewşa rojane ya Kurdistanê û realîteya gelê me ye.

Eger bi tenê armanc ev nivîsar bûya, bes bû min bi tenê perspektîva dîrokî, ango di vê delîvê de rewşa kurteçîroknivîsiya kurdî bi taybetî an jî wêje û zimanê kurdî bi giştî di dema nivîsîna van çîrokan de, li ber çavan

bigirta û diyar bikira ku birêz Lokman Polat karek bêwêne hêja kiriye. Bêguman ev yek bi serê xwe jî rast e: herçî ku pirtûkên kurdî niha jî kêr in û hunera çîroknivîsiya nûjen li cem me hê baş nekemiliye, di destpêka salên 90î de rewş sedcarî ji niha jî kamax- û wêrantir bû.

15 kurteçîrok wêneyek jêhatî li ser tevgera neteweyî û şerê çekdarî, jiyana gundiyan û zilma li ser wan, şiyarbûna gel û têgihîna rêça rizgariyê radixe ber çavên xwendevanan. Ango serekanî û îlhama nivîskar rewşa rojane ya Kurdistanê û realîteya gelê me ye. Jiyana gundewarî, sîtemkariya dijmin û zimanê kurteçîrokan realîst in û ji xwe ev yek armanca nivîskar jî bûye.

Li aliyê din baweriya nivîskar bi şervanên kurd bêsînor

10

1. Ev yek jî li ser herdu çavan. Lê nivîskar hevsarê lehengên xwe jî wisan dikêşe ku ew jî ji şervanan hez bikin, alîkariya wan bikin û hwd. Bêguman e ku bi mîlyonan kurd ji şervanên xwe hez dikin û ji her alî de alîkariya wan dikin.

Herçî zimanê çîrokan e, ew asan e û xweş li wan tiştan tê ku bas jê tê kirin. Hevok jî sade û baş kêrî wan kesan jî tên ku ji berî vê pirtûkê gelekî bi zimanê kurdî nexwendibe.

Husein Mihemed Kovara Mehname

Di van salên dawiyê de hinek wêjenasên me berhemên teze û balkêş afirandin. Yek ji wan Lokman Polat e. "Torina Şêx Seîd" , "Evîn û Jiyana" , "Evîndar" , "Mêrxas" , "Xwîn û Hêstirên Çavan" û hwd. Peyhev bê rawestandî gelek kurteçîrok nivîsand. Berhemên wî yên bijare mijarên xwe ji dîrokê, jiyana gel a civakî û ramanî, ji şerê qirêj bigire heya xopankirina gundan, nefibûyî û tevkuştina mirovan, ji şerê birakujiyê, şerê xwekujiyê bigire heya serkeftinên pêşmerge û gerîllan, serhildanan, tilîliyan, jiyaneke tijî û têrî xwe çarnalê pêşkêşî me dike.

Lokman Polat di berhemên xwe de her wek pêpelûgê, derînceyekî afirandinên xwe hildide jor, xwe nû dike û karê xwe di rêgehê wêjeyî de derdixe jor û honandina ele-qedariya xwerû jî dewlemendtir dike. Ew ne bes e, divê pêşdetir here û ez hêvîdar im ku Lokman Polat wê afirand-

dinên xwe yên wêjeyî bidomîne û hinek ji wan berheman wergerîne zimanê biyanî û bi wan bûyerên têkûz durîşma

11

me bi dinê -cîhanê- bide nasîn Û ji warê çîroknivîs de jî, ji bo me bibe dengek.

1. Dêrsimî Kovara Helwest

Li Stockholmê pirtûkek xwerû bi Kurdî derket, tay-betiya vê pirtûkê ew e ku; neşterê li birînekî kûr ya kurdan dixê. Pirtûk li ser şerê birakûjîyê disekine. Nivîskarê pirtûkê Lokman Polat bi zimanekî edebî, şerê birakujîyê wek çîrokekî dirêj, wek Novellek, anjî wek kurteromanek nivîsiye.

Di pirtûkê de, di gel Novelê hinek nivîs -meqale- yên ku hemû jî li ser babeta şerê birakujîyê ye hene. Ji xwe navê semivîsaran bi xwe jî balkêş e. Wekî; "Şerê Birakujîyê Şerekî Neheq e" "Vêca Şerê Xwekujîyê Ye" "Sê Kêmaniyên Kurdan" û hwd.

Pirtûka bi navê "Hawar Û Qêrîn (Bese Şerê Birakujîyê" di nav weşanên "Çanda Nûjen" de hatiye weşandinê.

Rojnameya Ronahî - Hejmar: 59

Di pêvajoyeke wehayî aloz de afirandina berhemên edebî zehf bi nîrx û pîroz e. Berhemeke edebî bi navê "Hawar û Qêrîn - Bese Şerê Birakujîyê" ji alî Lokman Polat ve hatiye nivîsandin. Nivîser bi hîlbijartina mijara berhema xwe de bi serketiye. Lewra nivîser bi herikandina vegotina berhema xwe re "şerê birakujîyê" yên di navbera me kurdan de ku ji sedan salan vir de dom dike, vedibêje. Dema ku meriv bi awayekî rêk û pêk berhema Lokman

12

Polat dixwîne, hinganê mirov dibîne bê çawa "şerê birakûjîyê" mala me kurdan wêran kiriye û dike.

1. Nisêbîni

Kovara Helwest - Hejmar: 5

Di vê mijarê de ez dixwazim li ser du pirtûkê Lokman polat yên bi navê "Bayê Azadiyê" û "Jin û Zîndan" rawestim. Berî her tiştî ez kekê Lokman Polat pîroz dikim ku ev herdu pirtûkên giranbuha li pirtûkxana kurd zêde

kir. Ji gelê kurd re ev xizmetek bi rûmet e û parçekî şerê serxwebûn û azadiyê ye.

Her çîrokek Kurdistanê, her serpêhatiyekî ku Lokman Polat aniye ziman trajediyek mirovahiyê ye! Gava em ser-pêhatiyên Polat dixwînin em dîsa tê de digehîjin ku li rûyê dinyayê, di mirov de çi potansiyela hovîtî, dilhişkî û xedarî hebe, bi destê mêtîngerên li Kurdistanê û li ser gelê kurd xwe rê dide. Ez bi xwe jî di zîndana Amed de vê wahşet û hovîtiya mêtîngerên tirk, hetanî kerta dawî jiya me.

Ez ji kekê Lokman Polat re berdewamiya serfiraziyê dilxwaz dikim û hêvîdarim ku di hundirê pêvajoyê de, ew dê berhemên bi rûmettir û girîngtir biberhimîne.

Xidir EGÎT

Rojnameya Pêşeroj Hejmar: 1 - Tirmeh 1997

Ez dixwazim di vir de piçekî li ser "Bayê Azadiyê" bisekinim, ji ber ku ev pirtûka, ku tijî xem û kul, mîna dilê min, wê bibe neynika rastîniya hêrêmên bakurê

13

Kurdistanê, ku di ve çerxa serdemî de bûye hêrişgeha ho-vane ya dewleta tirkî ...

Çend gotinên Cankurd

Bi rastî ji van bûyer û çîrokên ku di "Bayê Azadiyê" de hatine qelemkirin, mirov dikare rastiya hovdariya vê dewletê binase û di dîrokê de, mîna dubarekirina serdemên berê bi cih bike.

Bo giranbihayî ya vê pirsê, pirsê nivîsandina çîrokên rastînî yê serdemî, min dikarim bibêjim, ku "Bayê Azadiyê" raporeke dîrokî ya gelek hêja ye li ser karên hov-ane û dîdarnameyeke li ser mêrxasî, berxwedan û cangoriya gelê me yê belengaze di vê dema wêran de li bakurê Kurdistanê.

Bi rastî hinde çîrokên Lokman Polat, mîna neqş û ayînên li ser keviran dê her bimînin. Bo nimûne "Neviya Şêx Saîd", ku bûyera wê li gundekî xwedî dîrok derbas dibe. Mîna gelek keçên ku çûne şerê li hember zordariyê, wilo Mizgîn jî çûye şerî. Lê ji ber ku ew keç Neviya Şêx Seîd e, ev li ba tirkî tiştê gelek dijware. . . Mirov bê hewldana nivîskar û şirovekirina

dirêj têdigihîne ku şoreşa kurdan a sala 1925ê destpêkiriye, hîn li dare û ew şoreş jîna xwe digudîne.

Birayê hêja Lokman Polat di warê çîrokê de bizavên xwe yên hêja bigudîne, ji ber ku em pêdiviyê çîrokbêjane, ku êş û sohtin û wêrankirinên serdemî ji piştên (generation) kurd re, yên ku li pey me bîn, bi terzekî xweşik û rastîn bihêlin ... ev çande û ev histobariya nivîskare.

Cankurd Rojnama Hêvî

14

Merhaba Kekê Lokman,

Ez Dema Nû dixwînim. Nivîsên te jî baş in, li xweşa min diçe. Kurmanciya te jî xwe dide xwendin. Gelek heval hene pir zorê didin xwe. Heta mirov wan dixwîne, diçe alî din û tê. Lê ya te ne weha ye; wekî mirov biaxive tu dinivîsînî. Car caran bi diya xwe re diaxivim, ew di cî de mudaxele dike, dibêje, "Bi min re bi kurmanciya siyasi xeber nede." Belê, bi rastî jî gelek heval, wekî gotina diya min "kurmanciya siyasi" dinivîsînin; tenê ew fam bikin bes e. Lê ya te ne weha ye. Xweş e.

Bi silav û rêz.

Fehim Işık

Ev ntvtsa birêz firat Cewerî di malpera Netkurdê -weşaneke elektronîk e- de derket. Nivîs li ser mijara pêncîsaliyan bû û ev pirtûk jî ji bo pêncîsaliya nivîskarê kurd Lokman Polat hatibû amadekirin.

Lewre jî me vê' nivîsê ji malpera Netkurdê wergirt nav rûpelên vê pirtûkê.

Weşanê Helwest

Pêncîsaliyên me Firat Cewerî

"Tu ne wek pêncîsaliyan xuya dikî. " Pêncî salî wilo xuya dikin.

Gloria Steinem

Tê bîra min, gava di sala 1980 de min pê li erda Swêdê kir û di eynî salê de ji bo çapkirina kitêbeke xwe berê xwe

15

bi çapxanê vekir, ez xortekî nûgihîştî bûm, riha min nû derketibû, lê ez hê ji simêlan bêpar bûm. Ji xortekî wêdetir, heke mirov xortên niha bi bîr bîne, min hê xwe ji cîhana zarotiyê rizgar nekiribû. Lê ez li welatekî nû, li cîhaneke nû bi cih bûbûm û ezê paşê li vî welatê nû têketama nav

keftelefta edebiyata kurdî, min ê bi hemû edebiyatvanên kurd yên seranserî dinyayê re pêwendî daniya û bibûma dostê wan. Lê hingî hejmara nivîskarên kurd bi sînor bû. Min tavilê jî ew nas kirin. Ez yek ji wan kesên bi şans im ku min xwe gihand hemû nivîskar û şairên berî xwe û ez li Swêdê bi hevdemên xwe re bûm dost.

Ji xwe salên ku ez behs dikim hejmara nivîskarên kurd pir kêm bû. Yek ji nivîskarên ku berî min bi salan li Swêdê bi cih bibû Mahmûd Baksî bû. Mahmûd Baksî hingî li Stockholmê bû û ez jî bi wê xortaniya xwe li Uppsalayê bi cih bûm. Hingî Mahmûd Baksî ji Stockholmê lêxist û ji bo ku ji min re tercimaniyê bike hat Uppsalayê. Mahmûd Baksî ne ew Mahmûd Baksîyê ku we vê dawiyê resimê wî dît, lê ew xurt, dagirtî, bi por û simêl bû. Ew bi hêvî bû jî, wî bîra mirina her kesî dibir, lê bîra mirina xwe nedibir. Min ew Baksî nas kir. Wî pêncî sal li dû xwe hişt û mir.

Dû re gava min li Uppsalayê dest bi fêrbûna zimanê swêdî kir, min Mehmed Emîn Bozarşan nas kir. Me li eynî dibistanê ziman dixwend, bi salan kitêbên xwe li eynî çapxanê dan çapkirin. Bozarşan hingî pêncîsaliya xwe dane girtibû, lê mala Xwedê ava wî niha ji mêj ve pêncî sal li dû xwe hiştiye û hê jî mîna xortekî pêncîsalî dixebite.

Heke Rojen Barnas nexwaze emrê xwe eşkere bike jî, ezê lê mikur werim û wî bidim dest. Wî ji mêj ve pêncî sal li dû xwe hiştiye û niha mêvanê şêstî ye. Ji xwe heke ez bibêjim Amed Tigrîs jî piştî saleke din dikeve şêstî, dibe

16

ku hûn bawer nekin. Lê bawer bikin ku piştî saleke din Mûrad Ciwan dibe pêncî salî. Mahmûd Lewendî bêdeng e, lê wî jî pêncî sal li dû xwe hiştiye. Divê Zinarê Xamo jî pêncî tahmandibe. Weha li Malmîsanij menêrin, wî sê salên din jî li pêncîsaliya xwe zêde kirine. Yekî din ku ji mêj ve ye pêncî sal li dû xwe hiştiye Reşo Zîlan e. Lê gava min di sala 1980 de Reşo Zîlan li Uppsalayê nas kir, hê jî pêncîsaliya wî re qonaxek mabû. Wî niha ew qonax derbas kiriye û maşaleh hê jî wek fêrisekî ye. Tew Emîn Narozî pênc salên din jî li pêncî saliya xwe zêde kiriye. Şerefxan Cizîrî berî pêncî, Xelîl Duhokî jî piştî pêncî xatir ji Swêdê xwestin û veşeriyên welatê xwe.

Ev çend sal in ku Ferhad Shakely jî xatir ji pêncî xwestiye û berjor diçe. Heke Zeynelabidîn Zinar ne di pêşiya Ferhad Shakely de be jî, lê pê re dimeşe. Berî bi du salan jî me li mala Mehmed Uzun pêncîsaliya wî pîroz kir. Îsal malpera Tîrêjê pêncîsaliya Ehmed Huseynî da pîrozkirin. Di meha nîsanê de Sedat Anter pêncîsaliya xwe pîroz kir, lê ji ber ku ez ne li malê bûm, ez nikarîbûm di şahiya pêncîsaliya Sedat Anter de beşdar bibûma. Dawiya vê hefteya derbasbûyî jî em ji bo pîrozkirina pêncîsaliya Rohat Alakom civiyan. Rohat Alakom bi qerf û henekên xwe û bi dengê xwe yê xweş wek sihsaliyekî heqê pêncî saliya xwe dayê.

Her ku hevaleyê min yê li Swêdê pêncîsaliya xwe dadi-gire, ez di dilê xwe de dibêjim, aha weleh çû ji me de, lê dû re derbasî ber neynikê dibim û li xwe dinêrim. Erê, ew rûyê ku ez bi dilê xwe dibînim û yê ku di neynikê de derdikeve hemberî min, ne eynî rû ne. Ez rûyê xwe yê di neynikê de nas nakim. Lê ez gelek hevalan nas dikim ku rêwiyên pêncî saliye ne. Ne dût, hema piştî du-sê salên din

17

gelek hevalên min li deriyê pêncî saliye dixin. Silêman Demir, Hesenê Metê, Mustafa Aydoğan, Laleş Qaso, Ciwan Haco, Sidqî Hîrorî, Lokman Polat wê berî min pêncîsaliye bitahmînin. Ez, Alî Çiftçî, Mustafa Cizîrî, Mihemed Dehsîwar, Kamiran Haco bi hev re dimeşin, lê ez di pêşiya Enwer Karahan, Arif Zêrevan, M. Alî K. û Osman Ay tar de me.

Ev rastiyeke e, ezêdî ne ew xortê bîst salî yê ku di sala 1980ê de bixwebawer pê li erda Swêdê kiribû, niha hevalê pêncî saliyan im ...

Malpera Netkurd - 2005

18

" "

DI ZINDANE DE,

A A " A

BI TENE BU, BI SANCI BU

Rêzan dê bibana dayik. Bi êş bû, bi paşil bû. Di dilê xwe de canêkî din heldigirt. Hamîle bû, roj dijmart, destê wê di gohê wê de bû, bi sancî bû. Yê ku di zikê wê da bû, hêviya wê bû, dahatuya wê bû.

Wê xeyal dadaniyan. Papik çêdikir, fanorî direfandin ji bo bebika xwe. Dergûşê amade dikirin. Her roj bi çavê xwe li dergûşa vala dinêriyan. Wê xeyal dikirin ku rojêk bebika xwe hemêz bike û bi dil û can ramîse.

Rêzan dilxwişîş bû. Di binçav de, di şkencan de, mirov dihatin kuştin. Di nav qetlâman de, di bin bombeyan de mezinkirina bebika xwe difikiriya. Ditirsiya. Xew û xeyalên xirab didîtin.

Rojêk dagirker hatin û wê girtin bin çav. Wê birin kirin zîndanê. Ew ditirsiya. Tirsê wê ji bo bebika di zikê wê de bû. Di şkencexanê de pê gelek şkence kirin. Du roj wê dan binê ava sar. Serma bû, sar bû. Dilê wê cemidîbû. Bi wê serma nebû, bi bebika wê serma bû. Bebik ji ber sermayê di zikê wê de dileriziya. Dil û kezeba wê perçe dibû. Hêstiran di çavên wê de dikirin xwarê. Wê nalet li pêkanînên hov daniyan. Çavên wê li zikê wê diketin, li zikê xwe yê mezin dinêriyan, mêze dikirin û şerm dikir. Di zîndanê de, di şevên sar û tarî de, şêrînî û dilşadiya ku dê bibe dayik dijiyan.

Ew di zîndanê de bi tenê bû. Ji xwe re difikiriya. Ew dizanibû di hemû civakên cûrbecûr de tim jin hatibûn pelixandin. Hemû sazûman yên mêran bû, yên serdestan bû. Ew dizanibû ku dê çawan jin jî rizgar bibin. Wê rizgariya jinan bi rizgariya gel û welatê xwe va girêdidan. Di

19

çiyên de gerîlla, keç û xortên şerker, ji bo doza gel û welatê xwe, ji bo doza Kurd û Kurdistanê, ji bo azadiya gel û riz-gariya welatê xwe canê xwe dikirin feda. Ew canfidayên welatên xwe bûn. Di zîndanên de yên girtî gelek di berxwe de didan. Berxwedana wan rindiya wan û azadiya wan bû.

Di zîndanê de, sanciyên Rêzanê zêde bû, nefesa wê dihatin birîn. Bebikê di zikê wê de, pê li zikê wê dixistin. Acela . bebikê hebû. Dixwest, derkeve derva. Dixwest, dinya (cîhana) derve jî binasê. Di nav sing û berên dayîka xwe de dixwest bê hezkirin, bê maçîkirin. Dixwest memika dayika xwe bimisînê, bimijîne, şîrê wê vexwe û pê mezin bibe.

Êş û sanciyê Rêzanê zêde bibû. Devê wê zuwa bibû. Ji çavê wê hêstiran dikir xwarê. Rêzan di nav wê êş û sanciyê de, mêrê xwe difikiriya, malbata xwe û bebika di zikê xwe de difikiriya, rewşa gelê xwe û welatê xwe

difikiriya. Ew di nav zîndanê de bi tenê bû, xwe li erdê dirêj kiribû. Dinaliya. Wexta sancî dihat pê, diqêriya. Dengê hewar û qêrîna wê çubû gardiyanan. Çend gardiyan hatbûn li ser civiyabûn. Ew dizanibûn Rêzan hemî1e ye, dê biwelidê. Gardiyanan wê ji zîndanê derxistin birin odayekî. Li ser ranzayê wê dirêj kirin. Destê wê kirin kelepçan û bi ranzayê ve girêdan. Ew du roj bi destê kelepçekirî, di hemêza hêvî û dahatuya xwe de raza. Tî û birçî bû, lê bi hêvî bû. Piştê du roj êş û sanciyê, can ji beden ket. Bi ketina can, dayikê rehet kir; can, odê ronî kir: Bebik giriya, kir qêjîn. Qêjîniya wî qêjîniya azadî û serxwebûnê bû, qêjîniya hêviyê û dahatûyê, pêşerojê bû.

Gardiyanan destê Rêzanê ji kelepçan vekirin. Rêzanê bebika xwe girt, bi dilşadî hemêz kir û girt bersingê xwe. Memika xwe xist devê wî. Rêzanê gava memikê kir devê

20

bebikê bi ezber helbesta şairê ku bi eslê xwe kurd bû, helbesta Ahmed Arif ya bi sernavê "Êrişê pêsîrê -rnemikê-bike" bi ezber xwend.

Tebax 1994 Stockholm /Swêd

21

www.netewe.com

QANSER

Dilşa çû axurê, binê dewaran paqij kir, şîre çêlekê û mêşinê jî doşand, hew dît dîsan tîrêk ket singê wê; memika wê bû wekî agir, dişewitî. Hema dicîda şîr girt ji axur derket çû jor, di odê de xwe avêt ser mînderê û bê hemdê xwe kir qîrîn û hawar.

Ev bûbûn çend car ku weha tîra êşê diketin memikên wê. Lê wê digot belkî tişteke nebe, ew dê êş biçê û rehet bibe. Lê her ku diçû êş zide dibûn. Mêrê Dilşayê Seyîtxan çubû nava gund, ew û çend gundî li pêşiya camiyê rûnîştibûn, hinek gundiyan bi hev re diaxifiyan, du gundî jî bi hev re tirêzê dileyîstin. Seyîtxan xatir ji gundiyan xwe xwest û berê xwe da mal, gava hat ber deriyê xwe dengê qîrîn û zarîna Dilşayê, dengê girîna wê ket gohê Wî. Seyîtxan lez kir, di cîh de çû hundir, mêze kir ku Dilşayê li erdê digevize û bi deng hawar dike.

Seyîtxan got: "Çibû, dîsa êş û tîr ket canê te. " Dilşa dengê hawar û girîna xwe birî, jê re got: "Ji ber vê êşê ez nikarim bisekinim, de yax nakim. Bû çend car ez ji te re dibêjim min bibe ber dixtor, anjî min bi hekîmekî kurmanc nîşan bide. Lê tu qet goh nadî min, weha êş berdewam dike, ezê ji ber vê êşê bimrim. "

Seyîtxan heq dayê, bi rastî jî bûbû çend car ku Dilşa jê re gotibû; min bibe ber dixtor. Lê wî ew nebiribû ba dixtor. Ji xwe di gundê wan de nexaşxane tunebû, qeza jî ji wan pir dûr bû, ger ew bibira dê tonek mesref li heqê rê, razanê û tiştên din biçûna. Wî temehkarî kiribû û ew nebiribû ber dixtor. Nuha jî zivistan bû, rê û dirb hatibûn girtin, bixwesta jî nikaribû wê bibe qezê.

Seyîtxanji Dilşa re got: "Li ber xwe bide, xwedê mezin

22

e, ew dê şîfayek ji te re bişîne. " Dilşa got wî: "Ez jî li hêviya xwedê me, ancax ew dikare min ji vê ezabê xilas bike. " Seyîtxan rabû got: "Te ka û giya da dewaran?" Dilşa got: "Na. " Seyîtxan got: "Way ezê biçim axurê, yê bidim dewaran û ji wir biçim qehwa gund Heme Reşît bibînim. Hinekî karê min pê heye. "

Seyîtxan çû axurê, li aliyekî ka û giya dida dewaran, di aliyekî de jî ji xwe re difikirî; gelo ew dê çawan bibe, çar zaruyên wî hene, du law û du keç, ger tiştêk bi jina wî bibe, ew dê kî li zaruyên wî û li malê mêzeke, ya herî girîng jî wî û Dilşa ji hev hez kiribû û bi hev re zewicibûn.

. Seyîtxan karê xwe yê axurê qedand û berê xwe da qehwa gund, çû qehwê rûnişt, çayêk ji xwe re xwest, di navberê de gavêke kin derbas bû Heme Reşît hat qehwê, silav li Seyîtxan da û li ber rûnişt. Seyîtxan çayek jî ji wî re xwest. Qehwecî çay anî wan çaya xwe vexwarin.

Heme Reşît û Seyîtxan bi hev re virda wêda xeber dan, qala karê xwe kirin. Heme Reşît mêzekir ku Seyîtxan mirûz e û pir difikire, Wî jê pirsî: "Çiyê te heye, çi bûye, murizê te xirab dixuye, çi derdê te heye ji min re bêje, em hevalê hev in, gere em tiştan ji hev veneşêrin, ka bêje çi bûye?" Seyîtxan jê re ji pêş hatanî paş qala êşa Dilşa kir û got:

"Min tu çare nedît, ez nizamim çi bikim ku ji êşa wê re çarekê bibînim. Tu halê min dizanî, perê min jî tune ye ku ez wê bibim ber dixtoran. "

Heme Reşît bi devê kenîn destê xwe da ser milê Seyîtxan û got:

- Qet xem mexwe, min got da hele çi bûye, eva tiştê pir zehmet nîne, tu dev ji çûyîna ber dixtoran jî berde. Ew ê ku êşê dixê laşê meriv Xwedê ye û ewê ku derdixê jî dîsan ew

23

1. Êşê weha giran ancax alîmekî Xwedê li ser menv bixwîne û vê êşê ji laşê meriv derxe.

Li ser vê gotina Heme Reşît keyfa Seyîtxan hat cîh, dil ket ber û jê pirsî:

- Gelo, tu merivekî weha alîm nas dikî ku em Dilşa bibin ber wî, belkî wê rehet bike, duayê wî jê re bibe şîfa?

Heme Reşît got:

- Erê, ez alîmekî pir mezin û zana dinasim, di gundê Mirgesorê de rûdine, ji vir pir dûr nîne, ger tu bixwazî em dikarin bi hev re sibê biçin wî gundî.
"

Seyîtxan got, "De baş e, ezê hetanî sibê xeberê bidim te, nuha dereng bû ez rabim biçim mal. " Heme Reşît û Seyîtxan bi hev re rabûn ji qehwê derketin û heryekî lê xist, çû mala xwe.

Seyîtxan merivekî ne xwende bû, misilmanekî Xwedê, gundiyeke reben û belengaz bû. Ji dixtoran pirtir baweriya wî bi şêx û melan hebû. Ji ber vê yekê jî gava ku êş ketibû canê Dilşa, ew nebirî bû ber dixtoran, lê tenê ew biribû ber melê gund û mele jî jê re nivişt çêkiribû, lê nivişt jî tu feydek nedabû Dilşa.

Seyîtxan wê şevê bi Dilşa re got:

- Tu qet xem mexwe, ezê sibê te bibim gundê mêrgesorê ba alîmekî, ew dê ji nexweşiya te re çarêk bibîne.

Sibehtirînê Seyîtxan, Dilşa û Heme Reşît bi hev re li hesbên xwe suwar bûn û çûn gundê Mêrgesorê. Ew kesê ku Heme Reşît jê re digot alîm e, navê wî Şêx Mîrza bû, gundên der û dorê û gundiyeke wî, hema bêje hemû malê Xwedê didan. Bi zekata gundiyan dijiya û ji xelkê re nivişt çêdikir û di ser de pere jî ji wan distend.

Seyîtxan û ew din çûn mala Şêx Mîrza, destê wî maç kirin, el pence li ber rûniştin û Seyîtxan qala nexweşiya

24

Dilşa kir û got:

- Umuda me li jor Xwedê ye, li jêr jî tu yî. Nexweşiya jina min rehet bike, êşa canê wê bide sekinandin, tu çi ji min bixwazî ezê bexşê te bikim.

Keyfa Şêx li cih bû, yeke din jî ketibû destê wî. Şêx ji Seyîtxan re got: "Baş e kurê min, ezê çarek ji nexweşiya wê re bibînim û wê rehet bikim, de hun her du rabin li der va bisekinin, ka ez li ciyê êşa wê meze bikim û gorê wê duanjê re bixwînim. Lê hun belkî nizanin, gelo ji we re qal kirine an na, ku destê min şîfa ye, ez destê xwe tê bidim cîde rehet dibe û ez hişkan ter dikim, teran jî hişk dikim. Jinê ku bi salan zarû nayinin di saya min da dibin xwediyê zarukan, hetanî nuha tu tiştêkî ku min jê re çare netîtiye tune. "

Seyîtxan û Heme Reşît ji ciyê xwe rabûn, dîsan destê Şêx maç kirin û derketin der, Şêx û Dilşa tenê di hundir da man.

Şêx ji Dilşa yê ra got: "Keça min, qet şerm meke gorê ku mêrê te gote min, êş û tîr ketiye memika te, gere ez destê xwe bidim ser memika te û lê mêze bikim, gercî ewê destmêja min bişkê lê tişteke nabe. De haydê sîngê xwe veke û memikên xwe derxe derve. "

Dilşa şerm dikir, lê çi bike ji ber neçariya xwe sînga ' xwe vekir, memika xwe anî der. Şêx li memikan mêze kir, av ji devî wî çû, destê xwe da ser, da binî, rabû çû qapqapê anî tif kir binî û sê car li ser memikê xist, henî dua xwendin û dîsan destê xwe danî ser memikê û tevda, tevda, tevda ...
Û ev tevdan weha heftê carekê, mehê çar car dom kir, hetanî biharê. Lê nexweşiya Dilşa her çiqas diçû zêde û xedar dibû. Serê baharê ji ber neçariyê û ji ber qîrîna û zarîna Dilşa Seyîtxan mecbur ma ew bir qezê ba dixtor.

25

Dixtor ji Seyîtxan re got: "Jina te qanser bûye, di serî de gava êş ket canê wê te çima ew neanî, te wê gavê ew baniya ew çax hêja nû bû, mê çarek jê re bidiya, lê nuha çare tune. Em memika wê jêkin, ger em memika wê jênekin qanserê lê zêde bibe. Qanser nexweşiyeke pir xirab e, dide ber xwe û zêde dibe, dawiyê jî meriv dikuje. "

Seyîtxan nivišta mele û tevdana Şêxê alîm jî ji dixtor re qalkir û dawiyê got: "Dixtor beg, Dilşa sitûna nava mala min e, bila tiştêkî pê nebe, de bila qet memikeka wê jî tunebe. "

Dixtor gotê: "Di nexweşiya qanserê de tiştê herî xirab tevdana ciyê qanserê ye, çiqas meriv tevde ewqes dide berxe, zêde û mezin dibe. Ji xwe ewê ku mala jina te xera kirî ew Şêxê ehmaqê nezan bûye. "

Û dawiyê memika Dilşa jêkirin. Dilşa ji ber mirinê filîtî, lê êdî baweriya wê û Seyîtxan bi mele an jî şêxekî nema.

* Ev kurteçîrok pêşî di rojnama "Kurdistan Press" de hate weşandin û paşî di pirtûka Lokman Polat ya bi navê "Xwîn û Hêstirên çavan" de di sala 1995an de hate weşandin.

26

"

DU DILI

Bavê Narînê Mele bû. Melayekî welatparêz bû. Ax û kedera wî her tim ji bo Kurdistanê bû: Wî zarokên xwe bi şîûra mîllî ya kurdayetiyê mezin kiribû. Wî her tim ji zarokên xwe re digot:

- Ji bo doza Kurdistanê xebat bikin. Em belkî Kurdistaneke azad û serbixwe nebîn, lê divê hûn bibîn.

Narînê jî wek bavê xwe welatparêz bû. Narîn çubû dibistanê û dibistana navendiyê jî qedandibû, lê qet di bin tesîra dîtinên kemalîstiyê de nema bû. Narîn her kurd bû, welatparêz û şoreşger bû.

Narîn û Mahsûm ji hevûdu hezdikirin. Mahsum xortekî şoreşgêr bû. Piştê 12ê ilonê çend sal jî di zindanê dagirkerên tirk de razabû. Mahsûm piştê ku ji hefsê derket dîsa wek berê dest bi xebata siyasî kir. Têkiliyê Mahsûm bi rêxistinêke Kurd re hebû. Piştê demek Mahsûm, Narînê jî kiribû bi rêxistinê û wan herduyan bi hev re xebatê dikirin.

Rêxistina Mahsûmî li bajarê Stenbolê kovarekî fermî derdixistin. Erê kovar fermî bû, lê di kovarê de pêş ta paş li ser pirsê kurdî û rewşa Kurdistanê nivîs hebû. Kovarê di hejmeta xwe ya yekemîn de dest bi nivîsa diroka Kurd û Kurdistanê kiribû, diweşandin. Tehda û zilma dagirkerên tirk li ser kovarê pir bû. Xwedî û xwendevanê kovarê digirtin, kovarê dicivandin û ji bo ku di hêla aborî de kovarê qels bike, cezê pera

didan pê. Ev bûbû çend hejmarên kovarê derketibûn û hemû jî hatibû civandin, wan hejmaran qedexe kiribûn. Berpirsiyarê kovarê jî hatibû girtin.

Narîn û Mahsûm hêj di Kurdistanê da bûn û dixebitiyan. Rojek hevalekî Mahsûm jê re xeber şiyand ku

27

ew bê Stenbolê. Hevalê Mahsûmî jê re gotibû:

- Divê tu hevalêkî din, yê ku dîploma wî ya lîsê jî hebe bi xwe re bînî. Berpirsiyarê kovarê girtine, divê em yekî nû bi wezîfe bikin.

Mahsûm dizanibû ku dîploma Narînê a lîsê heye.

Mahsûm ji xwe ra fikiriya ku ew û Narîn bi hev re biçin Stenbolê.

Hezkirina Mahsûm û Narînê ji hevûdu re pir zêde bûbû. Ew çend car jî bi hev re raza bûn. Mahsûm nexwestibûn bi Narînê re razê, lê Narînê xwestibû û jê re gotibû:

. - Ji xwe çawan be em dê bi hev re bizewicin. Ka were em bi hev re razin. Ma qey tu sofî yî ku tu benda mahra olî (dînî) bisekinî.

Mahsûmî ji Narînê re gotibû: - Nabe! Em ecele nekin.

Lê Narînê pir îsrar kiribû û gotibû:

- Ev rîya ku em têde ne, mirin heye, zindan heye. Were em lingek zû bigihîjin miradê xwe.

Û bi vê tewirî Narînê Mahsûm îqna kiribû û bi hev re raza bûn.

Mahsûm û Narîn bi hev re çûn Stenbolê. Liwê qeyda Narînê ya resmî li ser kovarê çêkirin û Narîn bû berpirsiyarê nivisan ya kovarê. Mahsûm û Narîn li Stenbolê di mala hevalekî xwe yê rêxistinê de diman. Piştê çendek hevalên Mahsûmî, wî dîsa şiyandin Kurdistanê. Narîn di Stenbolê de ma û Mahsûm çû.

Narîn tim bi kar û barê kovarê re mijûl dibû. Di navberê de du meh derbas bû. Narîn adet nebibû. Berê her meh wek her jinî, jê xwîn dihatin, lê ev bûbû du meh ku xwîn jê nehatibû. Narînê fam kir ku hamîle ye.

Narîn li ser hamîletiya xwe pir difikiriya û meraq

28

dikirin. Dê çawan bibana? Bavê wê pê bihesiyana ku zarok haniye, dê çi bigotana? Gotinê dayika wê nûha ve diket guhê wê. Dê diya wê jê re bigotana: "Tu qehpik î, Te pîne haniye. Ev pîneê kê ye? Ji kê ye?"

Hevalên Narînê yên ku di Stenbolê de bûn û bi hev re di kovarê de kar dikirin jî nizanibûn ku Narîn û Mahsûm ji hev û du hez dikin, bi hev re razane û Narîn ji wî hamîle maye. Ew bi tenê wan du hevalê wek rêxistinî dizanibûn. Haya wan ji evîna Narîn û Mehsûm tunebû.

Narîn keçikekê pir şermok bû. Wisa şerm dikirin ku, îmkan tunebû ku qala evîna xwe û Mahsûm ji hevalên xwe re bike û ji wan re rastiya xwe û hamîletiya xwe bibêje.

Erê, dê çawan bibana? Narîn tim ev tişt difikiriya û mitale dikirin. Narîn çend roj dût û kûr fikiriya ku ji vê derdê xwe re riyêk bibîne. Narîn ewil fikiriya ku xeber bişeyne pey Mehsum, wî bîne Stenbolê û jê re bibijê; Ez hemile me, bebika te di zikê min de ye. Lê dê çawan xeber bişandana. Erê Mehsum di Kurdistanê de bû, lê Narîn nizanibû nûha di kîjan bajar, navçe an gundê Kurdistanê de ye. Narîn bi karê rêxistinî ya siyasî dizanibû. Îro li vir e, sibê li cîhêkî din e. Ku ji hevalên xwe re bibêje bila Mehsum bê li vir, dê hevalên wê bibêjin, "Xêre! Çima bê? Karê wî li Kurdistanê heye. Şert e bê va?"

Dê wê gavê ew çi bibêje. Nedibû. Şert û îmkan tunebû ku Mehsum bê Stenbolê. Narîn rêyekê din 'fikirî. Piştê fikrandineke kûr, Narîn ew rê dît. Erê, tenê ev rê li ber mabû. Vê rê, wê ji vê ezabê xilas dikirin. Rê jî ev bû; Kurtaj.

Narîn, dê biçana nexweşxanê, an jî dixtorêkî (bijîjk) xususî bidîtana û zarok ji ber xwe bikirana. Rêkî din tunebû.

29

Zikê Narînê hinek mezin bûbû û her roja ku diçû, hîn jî mezin dibû. Narîn li Stenbolê di maleke (Rêxistinê ew mal kirê kiribû) de bi hevalekî xwe re dima. Ew hevalê wê yê malê jî di kovarê de dixebitiya. Ji bo kovarê nivîs dinivisand. Ew jî ji cîhêkî din, cîhêkî dût hatibû Stenbolê. Ew hevalê Narînê zewicandibû, lê jin û zarokên wî li Stenbolê nebûn. Carna şeş meh an di saleke de carêk diçû mala xwe, li cem jin û zarokên xwe çend roj an çend hefte dima û dîsa dihat. Hevalê wê jî pir şermok bû, mirovekî

melayim bû. Carna qet serê xwe bilind nedikir û li jineke mêze nedikir.' Karê nav malê jî piranî wî dikir. Malê paqij dikir, firaqan dişûşt, çay çêdikir. Nedihişt Narîn destê xwe bavêjê tiştêk. Narînê wexta didît ku ev hevalê wê karên malê hemû dike, ji xwe re di hûndirê xwe de digot: "Jina wî kê ye? Xwezî bi canê wê. Ew gava di mal de be, jinik ji xwe ra rehet dike. "

Narînê biryara xwe da ku, bebikê ji ber xwe bike.

Lewra wê qet nedixwest ku hevalên wê pê bihesîn ku ew hamîleye, bebika wê heye. Narînê xistibû heşê xwe, digot "Ku heval pê behesîn dê bikevin şuphê, bêjin qey ez û ev zilam di malek de dimînin, gelo em bi hev re razane ku vê hevalê rêxistinê, min hamile hiştiye? Ku jina vî hevalî bi vê rewşê bihesî û dedîqodiyêke weha biçe guhê wê, dê çi bibêje?"

Rojek Narîn ji kovarê derket ku biçe nexweşxanê bebikê ji ber xwe bike. Di riya nexweşxanê de Narîn li parqê runişt ku henî bêhna xwe bide. Narîn runişt û destê xwe rast da ser zikê xwe, bir û hanî, gerand û bi bebika zikê xwe re axifiya.

Narînê weha got:

- Kurê min, an jî keça min. Ez nizamim tu kur î (lawî)

30

an keç î (qîz), lê ji bo min qet firq nake. Tu ewladê min î. Tu bê siûd î. Qet şansê te tune ye. Ku siûda te hebana, dê bavê te li vir li cem min bana û min dê te bi saxî û xweşî banîyana dinyayê. Lê nûha ez nikarim te bînim dinyayê. Rewşa min dest nade ku ez te bînim. Ez dizanim, tu di zikê min de ganî (zindî) yî. Lê hêj bavê te, nizanê ku tu heyî û di zikê min da yî.

Nûha ez di riya nexweşxanê de me. Diçim wê ku te ji ber xwe bikim. Bi destê xwe te bikujim. Ez dê te ji ber xwe bikim û bibim qatîlê te. Divên Kurtaj, katîlbûyîna ewlad e. Weha dibêjin û ez jî dibim qatîlê ewladê xwe. Ez nizamim ez çi bikim? Ez te bikujim, an na? Ez dudil im. Dil peritî me. Kezêba min dişewitê. Ez dê çawan bibim qatîlê ewladê xwe? Ku bavê te pê zanibana tu heyî û di zikê min de yî, ez dizanim wî qet nedihişt ku ez te ji ber xwe bikim. Wî tim ji min re digot: "Dê roj bê, em bi hev re bizewicin, zarokên me hebin. Bila hemû law bin. Ez dê navê wan Serdar û Egît deynim. "

Erê kurê min, bavê te weha digot. Lê destê min naçe te, destê mirovî çawan diçe ewladê mirovî? Ez te nakujim. Ezê te bînim dinê, te xweyî bikim, mezin bikim. Ez dê navê te jî Ferman deynim. Ferman hevalê bavê te yê him biçûkayiyê û him jî hevalê wî yê hefsê, zindanê bû. Bavê te ji Ferman pirr hez dikir. Ez dê te bînim û gava bavê te nûh bê te bibînê, ez dê jêre bêjim han ji te ra Fermanê biçûk. "

Narînê van gotinan ji bebika zikê xwe re got û sekinî, bê deng ma. Çirpênî bi hûndirê wê ket. Te digot qey bebikê di hûndirê zikê wê de xwe livandiye. Destê wê li ser zikê wê bû. Hendî di xwe de teqet nedît ku rabe û bi ber aliyê nexweşxanê ve ling bavêjê. Germ bu, kele kela havînê bû.

31

Rojê tîrêjê xwe dabû ser Narînê. Wê ji ber tîrêjên rojê xweydan dabû. Wê di xwe de cehd nedikir ku ji ber rojê rabe û biçê di binê siya darê de ronîke. Germa tavê (rojê) li zikê wê dixist. Çawan roj li dendika toximê dixê û vedike, jîn dide, tîrêjê rojê weha bebikê di zikê wê de bi jîn dikir.

Ev bûbû çend saet ku derbas bûbû. Narîn ji şuna xwe ranebûbû. Him kûr kûr difikiriya û him jî bi bebika zikê xwe re diaxifiya, Yekê ku wê bi ew halî bidîtana, digot qey ev keç dîn buye û xwe bi xwe xeber dide. Dudilî zor bû. Mirov gava di tiştê de du dil be, nizane çi bike.

Narînê dîsa dest pê kir û bi bebika zikê xwe re axifiya: - Bebika min, delaliya min, ronahiya çavên min, ez dê çi bikim? Çawan bikim? Ez dizanim ku tu zanibûyayî ez te dikujim, tu dê bizariyana, dê te bikirana hewar û qêrîn. Ku zimanê te hebana û dengê te bihatana min, dê te ji min re bigotana, "qey rizqê min tenê li dinê tune ye. Ji bo min nan li dinê tune ye. Ez gune nîn im, tu çira min dikujî? Min nekuje. Ez dixwazim bavê xwe bibînim, xwe bavêjim hustiyê wî, bila min hemêz bike, bila min têr û tijî ramûsê. "

- Erê bebika min! Heqê te yê jiyanê heye. Çima tu jî wek me nejî? Tu bibî û hetanî ku tu mezin bibî, belkî em welatê xwe rizgar bikin, gelê xwe azad bikin. Tu jî wek zarokên .gelê me di nav aşîtiyê de jîyanekê bextewar bijî. Bebika min, xweşika min, ez te nakujim, îro min bi te re pirr xeber da, hêj ez dê pir û pir jî bi te re biaxifim, Hetanî ku tu bêyî dinê, hetanî ku neh meh û neh rojê te biqedî, ezê bi te re xeber bidim, ji te re name

binivisînim. Ez dê navê namê xwe daynim: "Nameyê ji bebika ku hêj nehatiye dinê re

- De heydê, nûha em rabin biçin malê. Qeda û bela li

32

nexweşxanê bikeve. Hendî ez lingê xwe vir ve, bi vê alî ve navêjim.

Narîn rabû, berê xwe da mal, çû malê. Hevalê wê berê hatibû malê. Nan û wexwarin çêkiribû, hazir kiribû, her derî paqij kiribû, demlika çayê jî danîbû ser agir û çûbû li ber compîtorê runiştibû nivis dinivisandin. Hevalê wê yê melayket jê re got: .

- Nan hazire! Nanê xwe bixwe û were li vê nivisê binêre. Henîk dirêj bû, em bi hev re piçêk kin bikin.

Narîn çû metbexê. Nan li wê bû, lê ew birçî nebûbû. Ji xwe nan di qirika wê de nedîçû xwarê. Ew dilêş bû, mirûz bû, xwedanê derd, kul û keder bû. Nan nexwar. Ji xwe re û ji hevalê xwe re çay tê kir û hat cem hevalê xwe runişt, nivisê girt destê xwe û xwend.

Hevalê wê jê pirsî:

- Te çira nan nexwar? Narîn:

- Sipas! Ez têr im. Loma min nexwar.

Hevalê wê, navê wî Kamil bû, an Salim bû. Henîka jê re digot Salim, henîkan jî digotin Kamil. Narînê tenê jê re digot "Heval" navê wî yê din bi ser ve nedikir. Hevalê wê mirovekî melayîm bû. Hesûd nebû. Fêlbaziyê nizanibû. Wek hinekan fen û futê wî tunebû. Mirovêkî baş bû, dilşewat bû, lê pir cimrî bû. Narîn û hevalê xwe bi perê (dirafê) rêxistinê dijiyan. Kiriya wan a xanî û hemû mesrefa wan rêxistinê didan. Wan û çend hevalê wan yê din jî bi profesyonelî kar û xebat dikirin, bi karê kovarê re mijûl dibûn. Hevalê wê ji bo ku pirr cimrî bû, gava Narînê got, "Ez têr im, lewma min nan nexwar, " hevalê wê got qey wê li derve nan xwariye, loma ji Narînê re got, "Li derve nan nexwe, biha ye. Em tişt bistînin, di malê de nan çêbikin hîn

33

erzan tê. Ew gav mesrefa me pir naçe. " Narînê tiştêk negot, dengê xwe nekir.

Di wan rojan de Narînê û hevalên xwe him kovar derdixistin û him jî li ser pirsên civakî û neteweyî ya kurdan pirtûkan jî çap dikirin. Di wê mehê de jî pirtûkek li ser diroka Kurdistanê ya nûjen derxistibûn. Narînê qutiyeke giran helgirtibû û êşêk ketibû piştî wê. Piştî wê pir dihêşiyar û ew ditirsiya ku gelo bebikji ber neçe!

Bû êvar, mexrîbê ew û hevalê xwe ji buroya kovarê der-ketin. Çend hevalên wan di buroyê de man bi datayê nivis dinivisandin. Hevalê wê got:

- Em îşev mêvanê hevaleyê ne. Me dawet kiriye, em dê biçin mala wî, bi hev re nan bixwin û ji xwe re sohbet bikin, biaxifin.

Narîn û hevalê xwe yê mulayim bi hev re çûn mala wê hevalê xwe yê din. Wan, bi hev re nan xwarin. Êşa piştî Narînê berdewam dikirin. Lê wê jî hevalên xwe re negot ku piştî wê dêşê.

Piştî xwarin û wexwarinê, nûçeyên TVê jî guhdarî kirin û dest bi sohbetê kirin. Ji hezar kanî av hanîn, li ser hemû tiştan axifiyan. Gotin hat ser şehîdan. Hevalên wan yê xwediyê malê got:

- WeHa, ez pir li ber bûyera heval Mehsumî ketim.

- Wî gava weha got, Narîn zer û zuwa bû, guhê xwe bel kir, dawiya axiftina hevalê xwe sekinî. Gava hevalê wê got:

- Bila serê we, serê me û serê gelê Kurd sax be. Heval Mehsum heyf bû, zu şehîd ket.

Wê gavê Narînê kir qêrîn û hewar, li çokê xwe xist, xwe bilind kir li erdê xist û giriya. Hevalê Narînê nizanibu ku Narîn û Mehsum hev û du di nêzîk de dinasin, an ji hev û

34

du hezdikin. Heger ku bizanibana dê şehîdbûna Mehsumî negotana. Hevalê Narînê yê malî, yanê hevalê wê yê milayim pê hesiyabû, dizanibû ku Mehsum şehîd ketiye, lê ji Narînê re negotibû.

Piştî ku Narîn pê hesiya ku Mehsum şehîd ketiye, qîre qîra wê û zara zara wê bûn. Hevalên wê, ew aş kirin. Gotin megrî. Lê Narîn ji kul û kedera, ji kerba û ji êşa laşê xwe bê heş ketibû. Jina hevalê wê yê xwediyê malê qolonye hanî li ser û Tûyê Narînê kir. Hinek heş hate serê Narînê. Piştî demêkê kin derbas bû, êşa Narînê zêde bû, sancî dihatin pê. Narînê di

xwe de hîs kir ku xwîn jê dihat xwarê. Lewra nava çogên wê germ bûbû. Narînê ji jina malê re got, "Rewşa min xirabe lingêk zû min bibin nexweşxanê.

"

Hevalên wê, di cî de wê kirin texsiyê û birin nexweşxanê. Li wê bebik ji ber Narînê çû. Dixtor ji hevalên wê re got, "Bebik ji ber çû. Tiştêk nabe, metirsin. "

Hevalên Narînê ji xwe re şaş û ecêp man. Lewra wan digot qey, Narîn qîz e (keç e), bakîre ye.

Narînê ji vê halê xwe pir şerm kir, li berxwe ket, li ber bebika xwe ket. Lê çibike, tiştêk di destê wê de tunebû.

Narîn piştê ku ji nexweşxanê derket, hendî ji şerman mimkun nebû ku karê buroya kovarê berdewam bike. Loma ji hevalê xwe yê milayîm re got:

- Te waye rewşa min dît. Ez ji te re bibêjim çi? Bi çi rûyî ez dê hendî li vir bimînîm û bixebitim. Ez dixwazim hûn îcaza min bidin, ez biçim malê.

Hevalê wê jê re got:

35

- Baş e tu dikarî biçî.

Hevalê wê çû bilêta wê birî, hinek jî pere (diraf) da pê (vêca cimrîtî nekiribû) û Narîn li otobosê sêwar bu û çû mala bavê xwe.

* ji pirtûka "Evîndar" sala çapê: 1996 - Stockhol / Swêd

36

"

KEÇAELEWI

Herduwa jî bi destê hevdû girtibû û di ber çemê nav bajêr de dimeşyan. Hinek rê çûn, li ber çem kafeteryayêk hebû, çûn li wê rûniştin. Keçikê bi destê kurik hişk girtibû, jidandibû. Keçik bi tirs bû. Dilê Wê wek xişûşê lêdixistin. Di hundirê wê de hîsêk çêbûbû, dê ew û kurik negihîştana miradê xwe. Wê nedixwestin belêk an jî tiştêk bê serê kurik. Wê ji kurik pirr hez dikir. Lê kurik, qarekterekê xwe yê zeîf hebû. Mirovekî bê guman bû, tiştêk ji xwe re nedikir derd. Dinê xirab bibana xema wî nebû. Ji xwe re digot ez welatparêz im, şoreşger im, lê welatparêzî û şoreşgeriya wî

wek tolaz û qirixên Xançepekê bû. Keçik bi vê rewşa wî dizanibû, lê dîsa jî jê hez dikir, dilê wê ketibû pê.

Keçikê ji kurik re got:

- Malbata min, dê min nedin te. Ji bo vê jî were em dev ji hev berdin, bila ji bo me bûyerek xirab çê nebe.

Keçik, navê xwe Nermîn bû. Kurd bû, lê bav û dayika wê elewî bûn. Elewiyan jî, zû bi zû keçên xwe nedidan kurdên sînî. Kurik jî navê wî Mizafer bû. Ew jî kurd bû, lê elewî nebû. Mizafer û Nermînê hevdû di komelê de dîtibûn û di nav pêvajoya jiyanê de dilê wan ketibû hevdû, ji hev hez dikirin.

Nermînê wexta ku got, "Em dev ji hevdû berdin, " Mizafer hêrs bû, xwe aciz kir û got:

- Çima emê dev ji hevdû berdin? Qey tu ji min hez nakî? Ka evîna me? Te çi zû jibîr kir? Malbata te çima te ~ede min? Ger te nedin min, ez jî dê te birevînim.

Nermîn:

- Kiro tu qey min fam nakî. Qey tu nizanî ji bo çi min

37

nadin te. Em elewî ne, tu sîniyî; loma dê min nedin te.

Mizafer:

- Ez sînî nînim, tiştêk nînim. Hûn çira elewîcîti dikin.

Em sînîcîti dikin, ev çiyê! Ka tu şoreşger bû, bavê te jî welatparêz bû. Ev elewîcîti çiyê?

Nermîn:

- Elewîcîti di eslê xwe de pêşverûtiye, lê ez nizanim çima keçên xwe zû bi zû nadin sîniyan. Hemû elewî bi hevdû re dizewicin. Lê, dîsa jî tu were min ji malbata min bixwaze, belkî min bidin te.

Mizafer:

- WeHa ku wehaye, ez qet nayê te naxwazim. Ezê te birevînim, qediya û çû. Ewê ku emji hev hez dikin, emê bi hev re bizewicin, malbata te nikarê bibe asteng ji me re. Hevalekî min hebû, keçika elewî revand û qet tiştêk jî nebû. Hêj jî bi hev re dijîn.

Di nabeynê de demêk derbas bû. Mizafer neçû Nermînê ji mala bavê wê li gor urf û adetên nexwest. Keçikê îqna kir û bi riza dilê wê, ew revand. Piştê revandinê bavê keçikê Qasim xwe gelek aciz kir. Ji der û dora xwe re got:

- Kurik çira nehat wê nexwest, çira wê revand. Madem ku wan ji hevdû hez dikirin, me dê li gor urf û adetên xwe dîlana wan bikirana û wan bizewicandana.

Xeber çû ket gohê kurik û keçikê. Ji bo ku bavê keçikê li dij zewaca wan nebûn, wan jî gotin em biçin destê xalê Qasim ramîsin û li hevdû bîn. Nermîn û Mizafer bi çend hevalên xwe va çûn mala bavê Nermînê. Destê bav û diya Nermînê ramîsan û ronîştin dest bi axaftinê kirin. Nermînê ji bavê xwe re got:

- Me xeta kir, tu me bibexşînî.

Mizafer mirovekî ters bû. Li ser vê gotina Nermînê

38

hema di cîda gotina xwe got:

- Na!. Me xeletî nekiriye. Me ji hev hez kiriye û em bi hev re dijîn. Bavê te nikarê bibe asteng ji me re.

Qasim aciz bû, got:

- Kurê min, ez ji we re nedibûm asteng. Lê, divê li gor usul û qaîdên adetên me, hûn bizewiciyana.

Mizafer:

- Usul û adetên we paşverû ne. Hûn elewî keçên xwe nadin yê ne elewî.

- Bi vê tewirî mineqeşe dirêj bû. Wan tiştêk nexistin serê hev. Dawiyê rabûn çûn. Gotinên Mizafer gelek li dilê Qasim ketibû, Qasim bi wan gotinên wî pirr aciz bûbû.

Roja din, Qasim demançê da kurê xwe û jê re got:

- Ev tişt hendî bûye mesela namûsê. Divê tu herdûyan jî li ser hev bikûjî. Kurik demançê girt û çû li pey xweşka xwe û zavayê xwe geriya. Di kuçekî de derket pêşberê wan. Newînê gava birayê xwe dît, ji Mizafer re got:

, E A bukii

- eywax.. we me Ije

Nermînê hêj gotinê xwe neqedand, birayê wê demançê derxist û berê gulê da wan. Nermînê xwe avêt pêşiya mêrê xwe, jê re bû sîper. En pîr gule li Nermînê ket. Nermîn di cîh de mir. Mizafer jî birîndar bûbû. Birayê Nermînê jarjora xwe di wan de vala kir û reviya çû. Mizafer rakirin nexweşxanê.

Mizafer bi gotinên xwe yê ters û ji ehmeqiya xwe bu sedemê vê bûyerê û bu sedemê kuştina Nermînê. Bavê Nermînê jî xeletiyek gelek mezin kir ku, keça xwe bi destê kurê xwe da kuştin. Kurê xwe kir qatîlê xweşka xwe. Kurik jî û ew jî, dê hetanî xweş bin azabê wijdana xwe

39

H

bikşînin. Tradîsyonên weha divê hendî ji nav gelê kurd rabe. Gelek tişteki xetere ku mirov bibe asteng ku keç û kurên elewî an sûnî bi hevne nezewicin. Divê ev adetên kevnare hendî ji holê rabe.

* Ji pirtûka "Mêrxas - Serpêhatiyên Kurdî" Sala çapê: 1996

40

A A A

IMAM U PERWIZ

Şereke dijwar di navbera pastar û artêşa Xumeynî û pêşmergeyên kurd de berdewam dikir. Herdu alî jî, pirê caran ji sibê hetanî êvarê şer dikirin. Pêşmergeyan tî û birçî, li pişt kevirekî yan jî li bin deviyekî xwe bi erdê ve dizeliqandin û şer dikirin. Dengê tifîngan guhê mirov kerr dikir. Guleyên çekan wek barana meha nîsanê dibarîn. Bêhna barûtê, xwarinê dixist bîra zikên birçî.

Şer li ser axa Kurdistana Rojhilat (Îran) dom dikir.

Pêşmerge bi rê, dirb û gedûgên mintîqê gelek baş nasbûn. Di şerê gerîlla de rola vê yekê gelek girîng e. Bo vê yekê bû ku pastar û artêşa Xumeynî nikaribûn bi pêşmergan re serî derxin.

Dawiya meha nîsanê bû, berf ji ber baran û tava rojê heliyabû. Tenê li serê çiyayên bilind pelekê berfê xuya dikir. Berbanga sibê fermandarê pêşmergan, deng li pêşmergan kir. Pêşmergan xwe amade kirin, rabûn ji gund derketin û riya çiya girtin. Ew çûn li aliyêke gedûkeke kûr bêhn dane xwe. Fermandarê pêşmergan çar nobedaran li dorhêlê bi cih kir û zivirî

cem hevalên xwe. Ew rûniştin. Wan tûrên xwe vekirin ku xwarinê bixwin. Nanê wan hişk bû, qatix jî tunebû.

Nobedar Xoşnav dûrbîn danî, lê nihêrî. Çend qeretûn dît, valayiyek kete hundirê wî. Ew nikanîbû xwe zift bike. Wî dest avête keleşkofaxwe. Gulên xwe nihêrî û dîsa dûrbînê da ber çavên xwe. Demek bihûrî, dît ku ew qeretûn mirov in û çekên wan jî kifş kir. Wî di hendav de, bi dengê nizam gazî fermandarê pêşmergan kir û jê re got:

_ Fermandarê min, grubek pastar ber bi me ve tên! Fermandarê pêşmergan di cîde ji cihê xwe rabû û hat

41

cem Xoşnav. Wî dûrbînê ji destê Xoşnav girt û xwe avête pey kevirê û li derdorê mêze kir, li yên ku tên seyr kir. Fermandar hinek jî li derûdorê nêriya û dûrbînê da Xoşnav. Li derûdorê kendal, gedûg, dar û devî hebû. Xoşnav pêşmergeyekî ciwan û wisa jî bêsebir bû. Wî ji fermandar re got:

- Fermandarê min wexta seknê nîne, ka bêje em çi bikin?

Fermandar, pêşmergan li dorhêla xwe kom kir û ji wan re çend gotin got. Wî ferman da û pêşmerge li dorhêla herdu aliyê gedûgê bi cih û war bûn. Fermandarê pêşmergan got:

- Dema min tifing teqand, hûn jî dest bi şer bikin. Pêşmerge wisa mewzî girtibûn ku, wan kozikeke weke tîpa "U" li pêşiya pasdarên Xumeynî danîn. Haya pasdaran ji pêşmergan tunebû. Tifingên pasdaran li milên wan bû û yek li pey yekê dimeşyan. Nîşkave deng li wan hate kirin:

- Teslîm bibin! Hûn teslîm nebin emê we bikujin.

Ev deng, dengê fermandarê pêşmergan bû. Pasdaran tifingên xwe ji milên xwe anîn xwarê û her yekê xwe avêtin erdê. Pêşmergan dor li wan girtin û wan kirin çemberê. Piştî şereke kurt, anku di demeke kurt de pêşmergan pasdaran dîl (êsîr) girtin. Pêşmergan pasdarên birîndar birin nexweşxanê û êsîran birin girtîgehê.

Li perçeyeke herêma Kurdistana Rojhilat ya ku di bin desthilatdariya Partî Demokrat a Kurdistana Îran û Komeleyê de bû, hem nexweşxane û hem jî hepisxaneya şoreşê hebû. Pasdarên faris yên dîlketî di girtîgehan de bûn. Di nav êsîran de yek hebû, navê wî Perwîz bû. Perwîz xortekî bejn

zirav û çeleng bû. Bavê Perwîz gelek dewlemend bû. Hersal diravê (pereyê) ku li ser navê Xwedê

42

belav dikir, bi hezaran tumen bû. Bav û kalê Perwîz gelekî olperest bûn. Navbera bavê wî û hecî, xoce, mele û îmaman gelek başbû. Dema ku di navbera pêşmergeyên kurd û dagirkerên faris û paşî di navbera dewleta Îran û Iraqê de ku şer destpêkir, kalê Perwîz, bê hemdî ji bo rewşa Perwîz fikirî û ji xwe re di dilê xwe de got: "Şer dest pê kir. Wê roja Perwîzê min jî bê." û bi vê yekê ricifi, zer û zûwa bû. Rabû gazî Perwîz kir û wî da pey xwe û berê xwe da riya mala îmam. Ew çûn ber deriyê mala îmam û li derî xistin. Xulamekî îmam derî vekir û wan derbasê menzela mêvanan kir. Îmam odeya xwe ya mêvanan bi xalîçeyên ecem yê giranbiha, rengîn û xweşik raxistibû. Dîwar bi xalîçeyên dîwaran û lewhên bi ayetên erebî hatibûn xemlandin.

Dema ew derbasê odê bûn, îmam li ser limêjê bû. Wî limêja xwe kuta kir, zivirî silav da mêvanên xwe. Perwîz destê îmam ramîsa. Rûniştin, ji dinê û axretê xeber dan. Xulam semawerê dagirt, fincanan danî ser sêniyê û bi îzet û îkram ji wan re çay pêşkêş kir. Wan çaya xwe vexwarin. Kalê Perwîz got:

- Îmamê min, ji berê ve bav û kalên me dibêjine eqil ser eqilan de ne. Meriyê xwenda, ulmdar tim û daîm xwedanê fêhm û feraset in. Cenabê te dizane, şer dest pê kir. Di demeke kurt de hemû xort û ciwanan wê bigrin binê çek. Wê wan bişeynin qada şer. Tu dizanî Perwîz, sermiyan, hebik, ucax û delaliyê mala me ye. Wê di demeke kurt de roja wî jî bê ... Ji şer bireve, ew çax xîret û xeyseta me qebûl nake. Di şer de Xwedê neke belayek bê serê wî, ew çax dem û dewrana me gişt ber bi hewa diçe. Bê Perwîz tu neferekê mala me nikare bijî. Bi bihîstina wê xebera xirab, ezê jî ji kerban serê xwe deynim, bimirim. Xwedê wê roja

43

reş nîşanê me nede. Tu ne biyaniyî û vê yekê jî baş dizanî. Ez ji te hêvî û dexalet dikim ku, tu Perwîzê min re niviştêk çêbikî ku ew di şer de neyê kuştin, tu tiştêk pê nebe.

Îmam bi balekê xurt guhdariya kalê Perwîz dikir. Kalê Perwîz ku gotina xwe qedand, êdî îmam fam kir ku Perwîz û kalê wî ji bo çî hatine mala wî. Îmam serê xwe hejand, di hundirê xwe de jî hesabê fen û fûtan, zexeliya dikir. Îmam mirovekî fêlbaz, çav vekirî û wisa jî xwedanê deq û dolaban bû. Fenên wî wek fenên roviyê bû. Îmam demeke dirêj bê deng ma. (Ew çax merivên ku wî bidiyana, wê ji xwe re bigotana: "Ev çawa mirove ku wisa ketiye nav fikir û ramana ... ") Îman ji nîşkave serê xwe bilind kir û berê xwe da kalê Perwîz û got:

- Baş e, ezê ji Perwîz re nivişteke çêkim ku guleyên çekan ber bi wî ve neyên, heke bîni jî bi saya niviştê wê cîde bibin xwelî. Lê, tişteke din heye ... Ez gavek berê ketim mitalê û ketim heyra vî tiştî. Em bêjin ku bi saya niviştê gule li Perwîz neketin, lê ku guleyên çeka Perwîz xilas bûn û tîfinga wî wek darê di destê wî de ma ... Paşê jî neyar hatin û wî dîl girtin Ew çax wê çawa bibe?

Kalê Perwîz bi gotinên Îmam ve ricifi, zer û zûwa bû.

Dest û lêvên wî lerizîn, gewriya wî tije bû û bi awakê nerm peyivî:

- Qurban, ev tiştên ku cenabê te dibêje qet nehatibû hişê min. Tu çiqas bieqilî. Tu mirovekî ulmdarî û pêwîste ku dermanê vî derdî jî tu bibînî. Heke ji destê min bihatana çî îşê min li cem te hebû.

Bi vê yekê îmam dîsa xwe berda nav ramanan. Di navberê de demek bihûrîbûn ku, îmam ji ciyê xwe rabû û ber bi pacê ve çû. Li keleka pencerê refê pirtûkan hebû. Wî pirtûkek ji ref hanî xwarê û hate dîsa li ciyê xwe rûnişt û

44

di nav rûpelên pirtûkê de li ciheke geriya. Bêdengiyêke bi tirs û lîz di otaxê de hukim dikir. Tenê vîzevîza mêşan dihat' guhên mirov. Îmam dîsa ji ciyê xwe rabû, pirtûkê danî ciyê wî û ji kalê Perwîz re got:

- Belê ... Ezê ji vê tiştî re jî riyek bibînim: Nivişteke din jî ezê ji bo vê yekê çêkim. Wexta ku Perwîz êsîr bikeve, dê di cîde ji êsîriyê xilas bibe ... Lêbelê ez vê niviştê ji her kesî re çênakim. Ev nivişt gelek giranbiha ye û qîmeta wê gelek giran e. Tu fêm dikî bê ez çî dibêjim?

Kalê Perwîz serê xwe hejand û got:

- Belê, îmamê min, ez baş fêm dikim. Ji bo vê yekê ezê xelateke mezin ji te re diyarî bikim. Meraqê vî tiştî neke.

Bi vê yekê ve kêfa îmam hat, nîşkave ji cihê xwe rabû, pirtûkan ji ref anî xwarê û dest bi nivîsandina nivîstê kir. Wî hinek nivîsî û zivîrî ji kalê Perwîz re got:

- Ezê du nivîst ji Perwîz re binivîsim. Yek ji bo gule ber bi wî ve neyên, ya din jî, gava êsîr bikeve, ewê çawa ji êsîriyê bifilite.

Îmam nivîstên xwe nivîsand û bi berfirehî, dûr û dirêj, ji pêş hetanî paş ji Perwîz re qal kir ku di şer de çawa bike û bi çi şeweyî tevbigere. Îmam tembî li Perwîz kir ku nivîsta "dijê gulan" têxe stuyê xwe û ya dinjî di paşila xwe de verşê bide.

Li Îranê dem û dewran anku desthilatdarî di destê "Îmam"an de bû. Wan bertîl jî dixwar û ji xelkê xelatên giranbiha jî werdigirtin. Kalê Perwîz xelata îmam dayê, xatir jê xwestin û bi kêf û hiz zivîrîn mala xwe. Di navberê de demek derbaz bûbû. Rojeke bi fermî xeber şiyandin pey Perwîz jî. Êdî roja wî jî hatibû. Wî jî girtin bin çek û ewê dî beşdarê nav arêşa Îranê bûbû. Perwîz bû leşker. Di wê demê de Xumeynî ferman dabû û li dijê kurdan şer dest pê

45

kiribû. Artêşa Îranê êrişê axa Kurdistana Rojhilat kiribû. Di navbera pasdar û artêşa Îranê û pêşmergeyên kurdan de her roj şer hebû. Artêşa Îranê hêzeke leşkerî ku Perwîz jî di nav wan de bû, şiyandin Kurdistanê. Mifreza ku Perwîz têde bû pir caran dewriye digeriya. Roja dawiya meha nîsanê bû ku pêşmerge û leşkerên artêşa Xumeynî rastê hev hatin û dest bi şer kirin. Perwîz di şer de gelek tirsîya, lê wexta ku tembiyê îmam hate bîra wî, ji tirsî mirinê bi hindikayî be jî, xilas bû. Perwîz di nav axa şer de, li dorhêla xwe nihêrî, hê dengê tifîngan sar nebûbûn. Wî jî hema berê tifînga xwe da ezman û hemû guleyên xwe bi tewşê ber bi hewa ve avêt. Wexta dengê tifîngan êdî sar bû, ew jî cîde ji pey kevirê derket û destê xwe bilind kir û wek êsîrî xwe siparte pêşmergan.

Pêşmerga gelek leşkerên artêşê yên din jî weke Perwîz dîl (êsîr) girtin. Pêşmergan leşkerên Îranê yên êsîr girtin birin girtîgehê. Çawa ku nexweşxana pêşmergan ne weke nexweşxaneyên modern yên dinin,

wisa jî girtîgeha wan ne wek girtîgehên ku mirov di heşê xwe de difikire bû. Pêşmergan malek vala kiribû, derî û paceyên mehkem lêx-istibûn û wir kiribûn girtîgeh. Çend pêşmergeyên nobedar jî nobet digirtin.

Leşkerên artêşa Xumeynî di girtîgehê de, di nav xwe de dipeyiviyan û pirê caran jî wan ji xwe re digotin: "Ecêp, qey em pir xirab bûn, qey em nebihuştî (cenetî) bûn ku em di şer de şehîd neketin. " Ji nav wan leşkerekî ji şûna xwe rabû, hinek pêşve çû û bangê nobedar kir. Herhal wî dixwest lingek zû here bihuştê, loma ji pêşmergeyê nobedar regot:

- Min bikuje. Çima hûn min sax dihêlin? Pêşmerge bi gotinên wî kenîya û jê re got.

46

- Here li cihê xwe rûnî. Em êsîran nakujin.

Lê, Perwîz ne wek girtiyên din bê hêvî bû. Ew bi hêvî bû. Ew cara ewil ji mirinê filitî bû. Ya din jî tembiyên imam di bîra wî de bû û nivîşt jî di paşila wî de bû. Ji bo vê yekê Perwîz xwedanê moraleke bilind bû. Wî di dilê xwe de digot: "Çawa ez bi saya nivîştê ji mirinê filitîm, wisa jî ezê ji dîlbendiyê (êsiyê) jî xilas bibim. " Bi van ramanan ve Perwîz ji cihê xwe rabû û li derî xist, bang li nobedar kir. Nobedar bersîv da û got:

- Kî ye ew? Çi dixwazî? Perwîz:

- Ji min re tasekî av bîne.

- Qey ava cerê xilas bû?

- Na, ez vê avê venaxwim. Pêwîst e tu ji kaniyê ji min re tasek av bînî.

Pêşmerge nobedar serê xwe hejand û got:

- Ew av ji kaniyê hatiye, vedixwî yan venaxwî tu dizanî.

Ez ji te re ava nû naynim. Ji bîr neke ku tu dîlbendî.

Nobedar gotina xwe kuta kir û zivîrî, derî girt û ji Perwîz dûr ket.

Perwîz qehirî, hêrs bû ... Heta niha kîjan gotina wî bûbû didu ku îro tasek av dixwaze û jê re naynin ... Bi van ramanan ve heş di serê wî de nema, bi hêrs li derî xist. Bi dengê lêxistina derî ve, nobedarekî derî vekir û bi hêrs ket hundir û xwest ku çend sîle li wî dîlbendî bixe. Lê, ew çax nobedarê din ku navê wî Xoşnav bû, deng li hevalê xwe kir, got:

- Çiye heval, li wir çi dibe? Ew çi dixwazin ku bû du car derî dikutin?

Nobedarê din bersîva Xoşnav da û got:

- Xortekî cahil tasek ava teze dixwaze. Min jî ji wî re

47

got ku ava cerê jî nû ye, taze ye. Çima tu wê venaxwî? Wî jî got "ez venaxwim. " Niha ez herim çend sîle bidim binê guhê wî ku hişê wî bê sere wî.

Xoşnav:

- Heval, tu çi dibêjî? Qey tu dikarî zilm û tehdâ li wî dîl-bendî bikî? Çawa destê te lê radibe?

Nobedar:

- Çima nikarim ... Wî çend saet berê gule berdidan me.

Wan du pêşmerge şehîd kirin û çima ez nikarim du sîle lêdim?

Xoşnav:

- Belê, rast e, wan çend saet berê gule berdidan me û du hevalên me şehîd kirin. Lêbelê, ew çax me jî gule berdidan wan. Lê, niha çek û sîlahê wan di destê me de ne, ew jî di bin destê me de dîl mane. Wexta ku ew pêşmergeên me dîl digrin, pêşmerge birîndar bin jî, di cih de wan dikujin. Ew vê hovîtiyê dikin, lazim e emjî bikin? Heke emjî wek wan bikin, çi ferqa me û wan heye? Na heval! Em ji bo wek mirovan bijîn û ji bin nîrê koledariyê xilas bibin, şer dikin. Ev doz doza netewî ye, daw û dozekî miqedes e. Di vê rê de em tîn kuştin û mirovan dikujin. Ji ber kû em mecbûr dimînin ... Heval, tu bisekine, ez jê re avê bînim.

Pêşmerge Xoşnav çû tasek ava teze ji kaniyê anî, deriyê girtîgehê vekir û ji Perwîz re got:

- Birader, te tasek ava teze xwestiye, ha min ji te re niha ji kaniyê anî.

Perwîz tasa avê ji destê Xoşnav stend û bi lez -herhal dîlbendîtî bi wî gelek zor hatibû- ber bi kuncikê ve çû, tasa avê danî pêşberê xwe. Nivîştâ ku imam jê re çêkiribû ji paşila xwe derxist, sê car ramûsa û da ser eniya xwe û paşî kaxizê nivîştê hêdî hêdî vekir, heste (çaqmaq) ji berîka

48

xwe derxist û wê vexist û da binê kaxiza nivîştê ... Nivîştê şewitand û xweliya wê kir nav avê, bi pêçiya xwe xweliyê di nav avê de belav kir û tasê bire ber devê xwe ... Perwîz di sê qurtan de ava tasê vexwar. Tasê

danî erdê, li derdora xwe nihêrî, hevalên wî yên dîlbend û nobedar Xoşnav bi heyr û şaş metalmahiyekî va li wî dinêrin. Wî qet îstîfa xwe xirab nekir, ji ciyê xwe rabû û ber bi derî ve çû.

Xoşnav hê derî negirtibû. Keleşkofa wî di dest da bû û li rewşa Perwîz dinhêriya. Wî dît ku Perwîz dixwaze ji girtîxanê derkeve û bireve. Ew çax wî deng li Perwîz kir û got:

- Bisekine! Tu birevî, ezê te bikujim.

Perwîz, bi tirs û lerz zivirî ... Laş û gewdê wî giran bû, lingên wî êdî nikaribû bare gewdê wî bikşîne. Ew çax bi dengekî nizm û lerizîn pirsî:

- Qey tu niha min dibînî? Çawa perdeki reş nehatiye ser çavên te?

Xoşnav bersîva wî da, got:

- Çima ez kor im ku te nebînim? Qey ez ker im ku tu dixwazî min bixapînî! Here, ji xwe re wek hevalên xwe bêdeng bisekine, nexwe ezê te bikujim.

Perwîz bi tirs û lerz zivirî kuncika xwe. Şûşa dilê wî şikestiya. Kelogirî kete nava lêvan û di dilê xwe de digot:

"Çawa îmam min û kalê min xapand? Ewqas derew jî kir. Kalê min rûçikand. Çi îmamekî sextekar derket. "

Xoşnav bi ecêbmayî li Perwîz dinêrî. Dilê wî pê şewitî.

Ji hal û rewşa vî dîl bendî qet tiştek fêhm nekiribû. Wî dît ku Perwîz hûr hûr digrî, ew çax derge vekir û ber bi wî ve çû ... Li kêleka wî rûnişt, keleşkofaxwe da ser çokê xwe û demeke bêdeng ma û paşî jê pirsî:

- Ev çi bi te qewimî? Min ji te qet tiştek dernexist. Te

49

av xwest, min ji te re anî. Te kaxizek şewitand û xweliya wê bi avê re vexwar. Şûnda jî te xwest tu birevî. Kaji min re serpêhatiya xwe şîrove bike.

Perwîz bi gotinên Xoşnav ve hizî bû. Hêstirên çavên wî wek baranê dihat xwarê. Ew demeke bêdeng ma, wî hêstirên xwe paqij kir, li der û dora xwe bi çavên valahî û berxweketî nihêrî û got:

- Îmamê sextekar ...

- Kiyê îmamê sextekar? Çi bûye? Çi aniye serê te?

Perwîz serpêhatiya xwe bi berfirehî, dûr û dirêj ji Xoşnav re qise kir û got:

- Heger ez nemirim, ezê tola xwe ji îmamê sextekar bistînim.

Xoşnav destê xwe li pişta Perwîz xist û jê re got:

- Heke tu dixwazî bi saxî ji vir bifilitî, ji berpirsiyarên me re poşmaniya xwe diyar bike. Sond bixwe û careke din li dijî gelê kurd şer neke. Ger tu van şertan bînî cih, ez bawer im wê te azad bikin. Ji bo vê bifikire û paşî bersîv bide.

Di wê demê de, dîlbendên ku sond bixwarana û soz û peyman bidana ku li dijî gelê kurd careke din şer nakin, pêşmergan wan azad dikirin.

Xoşnav, serpêhatiya Perwîzê faris ji hevalên xwe re û ji fermandarê pêşmergan re qal kir. Fermandarê pêşmergan xeber ji lîqê partiyê re şiyand. Demek bihuri, berpirsiyarekî partiyê hat mintîqê û ji fermandarê pêşmergan re got:

- Di girtîgeha we de dîlbendekî bi navê Perwîz heye. Ez hatime ku îfadê wî bigrim. Heger tu betalî, tu jî bi min re bî baştir dibe.

Fermandarê pêşmergan ferman da ku Perwîz bînin

50

hizûra wan. Nobedaran Perwîz ji girtîgehê derxistin û wî birin. Ew çax Perwîz gelek tirsîya, wî ji xwe re digot, "Ecêb, vana dixwazin min bikujin?" Perwîz anîn cem berpirsiyarê partiyê. Berpirsiyar hal û rewşa Perwîz pirsî û jê re got:

- Heke em te azad bikin, tuyê çi bikî? Perwîz:

- Ezê îmamê sextekar bikujim. Fermandarê pêşmergan:

- Ew me eleqeder nake, ew mesela te û îmam e. Ne ya me ye. Ya me ewe ku; tu soz û peyman bidî me ku careke din li dijî hêzên gelê kurd şer nekî. Perwîz:

- Ez bi hezar caran sond dixwim ku careke din li dijî pêşmergan şer nakim, li dijî biraderên kurd tu tişteke xirab pêk naynim. Heger ji destê min bê, ezê alîkariya doza we ya bi heq bikim, bibim dost û alîgirekî doza heqê kurdan.

Berpirsiyarê partiyê:

- Emê te azad bikin, lê ne ji bo ku tu biçî imam bikujî yan jî nekujî. Em te berdidin, azad dîkin ji bo ku te sond xwar tu li dijî me şer nakî.

Partiyê biryar da û Perwîz azad kirin. Êdî Perwîz azad bû. Wî cil û lîbasê xwe guherand, kincên nû li xwe kir û xatir ji pêşmergan xwest û berê xwe

da bajarê xwe. Ew çû mala xwe. Wî dît ku dewr û dewrana mala wî wek berê ye. Pîra Perwîz li male bû. Keyfa wê hatibû ku Perwîz bi sax û silametî veqeriyabû male. Lê, kale wî ne li wir bû. Perwîz ji pîra xwe pirsî:

- Ka kale min?

Pîra wî ji kezebê axînek kişand û got:

- Sere te sax be. Kalê te çû ser heqîya xwe. Ew gelek li

51

ber te ket û dayax nekir.

Perwîz kelogirî bû. Destê xwe kire kêleka xwe, piştta wî xûz bû û li kuncikeke male bi bêdengî cihê xwe girt. Ew demeke ji dorhêla xwe dûr ket, fikirî, ramiya û giriya. Dema ku ew ramiya, ji xwe ve veciniqî û ji xwe re got, "Divê ez îmamê sextekar bikujim. "

Ev fikir di hişê wî de cih girtibû. Wî sedemê hemû tiştan îmam didît. Perwîz rabû, demançaya şeş derbê bi dizî xiste kêleka xwe û qesta mala îmam kir. Îmam ne li malê bû. Ew li mizgeftê bû. Perwîz zivîrî, li ber derê mizgeftê benda îmam sekinî. Mizgeft belav bû. Di dawiyê de îmam jî derket ku here mala xwe. Lê, ew çax çavên îmam li Perwîz ket, wî ew nas kir û biheyirî ber bi Perwîz ve çû, gihîşt cem û jê re got:

- Derbasî be! Em pêhesiyan ku tu dîl (êsr) ketî. Te gelek teda dît yan na?

Perwîz bersîva îmam neda. Îmam axaftina xwe domand û got:

- Serê te sax be! Kalê te gelek meraqê te kir û bi wê meraqê jî çû rehmetê. Min tim dil dida ber. Min jê re digot ku wê Perwîz bi saxî ji dîlbendiyê xilas bibe û vegere bê vir. Lê belê wî gelek meraqê te dikir.

Perwîz qêriya ser îmam û jê re got:

- Îmamê sextekar! Tu bûyî sedemê mirina kalê min.

Nivîştên te jî derew bû. Êdî te mirinê heq kiriye.

Îmam tirsîya, zer û zûwa bû. Wî keys û fersend nedî ku bireve yan jî bi çend gotinên derew Perwîz bixapîne. Perwîz demançaya şeşderb ji ber xwe kişand û gulên demançê di laş û bedena îmam de vala kir. Perwîz îmam kuşt, tuf kir laşê wî yê mirî û ji wir dûr ket, berê xwe da çiya.

52

Rojek dostekî pêşmergan ji bajar hatibû gund û bi xwe re hinek rojnameyên farisî jî anîbû. Xoşnav çavên xwe li rojnameyan gerand ~ bi dengê bilind ji hevalên xwe re wisa got:

- Hela li min guhdarî bikin!

Xoşnav dest bi xwendina nûçeyê rojnamê kir. Nûçe weha bû: "Di navbera pasdarên komara Îslamî û yên li dijê şoreşa Îslamî dertên de şereke giran çêbû. Pasdaran ji xay-inên dij şoreşê. gelean kuştin. Di nav wan kuştîyan de, qesasê îmamê mizgefta bajêr, Perwîz Gulamperê xaîn jî heye. "

Xoşnav ku xwendina vê nûçeyê kuta kir, demeke çavên xwe girt û bi xwe re mitale kir. Wî di dilê xwe de got:

"Nexwe Perwîz ata xwe anî cih. Wî him îmamê mizgeftê kuşt û him jî li cem şoreşgeran, azadîxwazan cih girt ... Aferim Perwîz, tu mêrxas derketî! ...

* Ji pirtûka "Evîn û Jiyan" Sala çapê: 1991 - Stockholm

Têbinî: Dema ez li rojhilatê Kurdistanê (Kurdistana Îranê) li cem pêşmergeyên Partî Demokrata Kurdistana Îranê bûm, ez bûbûm şahidê vê bûyerê. Piştî ku ez ji Kurdistana Rojhilat vegeyriyam û derbasê Ewropayê bûm, min vê bûyera Perwîz weke kurteçîrok nivîsî û di rojnameya "Roja Welat" - ya ku li Ewropayê derdiket- de weşand.

Paşê jî min vê kurteçîrokê di pirtûka xwe ya yekem ya bi kurdî "Evîn û Jiyan" ê de weşand.

53

A

JINA HEFSKIRI

Malbata Newînê ji ber sedemên aborî hatibûn li Almaniyayê cîh û war bibûn. Bavê wê di karxanêk de karker bû. Dayika wê jî di nexweşxanê de dixebitiyan, paqijî dikirin û li kesên kal (pîr) mêzedikirin.

Newîn û birayê wî Sedat jî di dibistanê de dixwendin.

Xwendevanê dibistanê tevlohev bûn. Biyanî jî hebû û Alman jî hebû. Newînê ji xortekî Alman hezdikir. Yê Alman navê wî Hans bû û wî jî ji Newînê hez dikir. Newîn û Hans tim bi hev re digeriyan. Newîn û Hans

dixwestin bi hev re bizewicin. Newînê, evîna xwe û Hans ji diya xwe re vekir. Dayika Newînê, jê pirr aciz bû, pê re şer kir û got:

- Em misilman û ew gawir; çawan tu bi wî re dizewicî.

Bavê te bi vê rewşê bihesî dê te bukiyê.

Newînê ji Hans re qal kir ku hezkirina xwe û wî ji diya xwe re qal kiriye û diya wê gotiye, ew ka:fire em misilmanîn, nabe ku tu bi wî re bizewicî.

Hans got, "Ez ji te gelek hez dikim. Dilê min ketiye te.

Ez evîndarê te me. Ji bo te ez amade me ku her tişt bikim. Ji bo xatirê evîna me, ez dikarim bibim misilman jî. "

Van gotinê Hans pirr keyfa Newînê hanî. Newînê dest avêt hustiyê wî û ew ramîsa, maçî kir. Demêk bi hev re man û paşê Newînê xatir ji Hans xwest, lez kir çû malê û ji diya xwe re got:

- Ez bi Hans re axifim. Ew ji bo hezkirina xwe qebûl dike ku bibe misilman.

Vê tiştî ji bavê min re jî bêje. Ez dixwazim bi Hans re bizewicim.

Bi şev, diya Newînê ji bavê wê re got ku Newînê û Hans ji hev û du hez dikin û dixwazin bi hev re bizewicin. Bavê Newînê kir qêre qîr. Şer kir, çêrê Newînê kir, têr û tijî kufur

54

kir, dijmîn da. Bavê Newînê usan hêrs bibû, hetanî wê rojê carna destê xwe nedabû keça xwe, qet lênexistibû. Ji hêrsan du sê sîle li binê gohê Newînê xist. Bavê Newînê him digiriyan, hem jî diaxifiyan, digot:

_ Ezê çawan keça xwe 'bidim vê gawirî? Ji Hanzo re keçên Alman qehet bûne ku tê bi keça min re dizewicî.

Bavê Newînê ji hêrsan, ji kurikê Alman Hans re nedigot Hans, digot Hanzo û çêrê wî fikir.

Malbata Newînê biryara xwe ya qethî dan ku dê keça xwe nedin Hansê Alman. Dê wê bi kurê apê wê re bizewicînin.

Kurê apê Newînê jê du sal piçûktir bû. Newînê jê hez

nedikir û nedixwest ku pê re bizewicê. Newînê ji malbata xwe re digot:

_ Hûn çêbikin jî, ez bi kurê apê xwe re nazewicim.

Bavê wê jî lêdixist û digot:

_ Bi zorê be jî ezê te bi kurê birayê xwe re bizewicînim. Newînê neçar bû.

Nizanibû çi bike. Çawan malbata xwe

Îqna bike ku bêhêlin ew bi Hans re bizewicê. Newîn li ser vê tiştî pîr fikiriya. Her roj Hans didiyan û pê re diaxifiyan. Hans jî şaş mabû, nizanibû çî bike.

Newînê li gor xwe riyê kî çareserkerinê dît. Wê xist heşê xwe ku ew bi Hans re razê û bakîretiya wê xirab bibe, dê ew dem malbata wê, mecbûr bimînin û ew bi Hans re bizewicînin. Newîn dizanibû ku keça nebakîre kes wê zû bi zû nabe, pêre nazewice. Kurê apê wî jî ku pê zanibe ew nebakîre ye, dê pêre nezewice. Newînê vê fikrê xwe ji Hans re qal kir. Newînê jê re got:

_ Ev tradisyona me ya kulturî ye. Em wek Almanan, Ewropiyan nînin. Li cem me bi keçên nebakîre re kes nazewice.

55

Newînê, Hans îqna kir ku bi hev û du re razin û Hans bakîretiya wê xirab bike. Erê, wê û Hans ji hev û du hez dikirin, lê hetanî ew roj Hans destê xwe nedabûn pê, bakîretiya wê xirab nekiribûn. Tenê wan hev û du radimîsiyan. Piştê ramîsanê, ji xwe Newînê jî nedixwest ku Hans pêşte biçe. Lê ev roj dê bigîhîştana miradê xwe.

Keça bakîre Newîn bi Hans re raza. Henîk canê (laşê) wê êşa, lê qet xema Newînê nebûn. Ew gihîştibûn miradê dilê xwe. Çarşeva binê Newînê xwîn bûbû. Newînê çarşevê rakir, qat kir ku bibe bi dayika xwe nîşan bide û bêje ez waye bûm jin, bakîretiya min xirab bû. Hans ji halê xwe memnûn bû. Ew jî gihîştibû miradê xwe û tehma kirinê di devê wî da bû.

Newîn çû malê û ji diya xwe' re got ku bi Hans re razaye û bakîretiya wê xirab bûye. Diya wê pê re şer kir, lê hêrs bû. Lê diya wê qet bawer nedikir ku bakîretiya wê xirab bûye.

Di nabeynê de du meh derbas bibû. Newîn ji Hans hamîle mabû. Newînê ji diya xwe re got ku ew hamîle ye û rapora doktor pê nîşan da. Vêca diya wê bawer kir, qêriya, giriya, porê xwe kişand. Diya wê got:

- Dê bavê te me bukijê. Te çawan weha kir. Tu bûy qeh-pik.

Diya wê, mecbûrî vê rewşa Newînê ji bavê wê re qal kir. Çavê bavê wê sor bû, hêrs-bû û kete ser Newînê, lêda, lêda. . . Piştê lêxistinê wê kir odê û derî li ser girt. Hendî nehiştin ku Newîn ji odê derkevê, an jî yek biçe odê cem wê. Di hundirê malê de Newînê hepis kirin.

Çend roj derbas bû. Hê jî Newîn di odê de hepiskirî bû.

Kurikê Alman Hans ji bo ku bibû çend roj Newînê nedîtibû, wê meraq dikir, ka gelo Newîn nexweşe, an tiştêk

56

pê bûwe?

Hans çû mala Newînê ku pirsas wê bike, ka bi Newînê çi bûye? Malbata Newînê, Hans û Newînê bi hev û dû re nedan nîşandanê. Birayê Newînê bi çov û êzinga li Hans xist. Di dev û pozê Hans de xwînê avêt derva. Lê Hans ji bo xatirê Newînê neçû cem polîs gilî û şikayeta birayê wê nekir, negot ku wî lêxistiye.

Paşê diya Newînê ji Newînê re got ku Hans hatiye pirsas wê kiriye û birayê wê jî li Hans xistiye. Newîn li ber lêxistina Hans ket, giriya, çavê wê tijî hêstir bûn.

Malbata Newînê jê re gotin:

- Divê tu bebikê ji ber xwe bikî.

Lê Newînê qebûl nekir, got ezê bebika xwe bînim dinê û bi Hans re jî bizewicim.

Ev bibû çend hefte ku Newîn di hundirê odê de hepiskirî bû. Hevala keç ya Newînê, navê wê Seher bu û wê jî ji bo ku zuve Newînê nedîtibû, merak kiribû. Seher çû mala Newînê. Diya Newînê derî vekir. Ev roj bav û birayê Newînê di malê de nebûn. Seherê ji diya Newînê re got:

- Newîn zûve nexwiya. Min meraq kir. Gelo nexweşe. Loma ez hatim ku pirsas wê bikim.

Diya Newînê got, "Keça min, derbazê hundir bibe.

Tofane hatiye serê me. Were hundir, rûne ez ji te re qal bikim. "

Seher derbazê hundir bû. Runiştin. Diya Newînê bi kur-tayî jê re qala rewşa Newînê kir. Seherê bi meraq gohdarî kir û paşê rabû ser lingan got:

- Newîn di kijan odeyê da ye? Derî veke, divê ez wê bibînim û pêre biaxifim.

Diya Newînê deriyê odê vekir. Newîn xwe dev û rû avêtibû û dirêjketibû. Wexta ku derî vebû û Newînê Seharê

57

dît ku ket hundir, di cîde rabû ser lingê xwe, pelê wê tunebû ku bifirê. Wê û Seherê dest avêtin hustiyê hev û du. Çavê Newînê tijî hêstir bibû, digiriya. Nûha, hem ji derdan û hem jî ji bo ku Seher hatibû cem wê ji keyfan digiriya.

Seherê ji diya Newînê re got:

- Tu deri li ser me bigre û here. Em hinek bi hev re tenê bimînin, biaxifin. Diya Newînê deri girt li ser wan kilît kir û çû. Newîn hinek jî giriya û paşê hêstirê çavê xwe paqij kir. 'Seherê got:

- Êêê!. Keça xemgîn, de bêje. Ev çi ye hatiye serê te ku te li vê odê hepis kirine?

- Newînê pêş hetanî paş rewşa xwe ji Seherê re dûr û dirêj qal kir û dawî got:

- Ez wusan bi dert û kul û keder im, difikirim ku xwe bi xwe bikûjim, întîxar bikim.

Seher:

- Na, keçê, nabe. Carek fikrê xwe kuştinê ji serê xwe derxe. Tu tiştêk wek jiyanê giring nîne. Ez li dijî zewicandina bi zorê me. Lê te baş nekiriye ku tu bi kurikê Alman re razayî. Gelo kurik bira jî dixwazê bi te re bizewice, an çend meh keyfa xwe bi te bike û paşê dev ji te berde, yeka din ji xwe re bibînê? Nûha di zikê te de bebik heye, gelo Hansê Alman bebik dixwazê? Ku ew bêjê ez bebik naxwazim dê çawan bibe? Divê tu li ser van hemû tiştan baş bifikiri.

Newîn:

- Hans dixwazê. Ez çi bêjim ew nabêjê na. Ji bo ku bi min re bizewicê, wî misilmanîtiyê jî qebûl kir. Wî gote ji bo xatirê evîna me, ezê bibim misilman. Tenê, bes bila malbata te bêhilê em bi hev û du re bizewicin, ew çi bêjin

58

ez qebûl dikim.

Seher:

_ Malbata te ne baş kiriye ku te li vê odê hefs kiriye. Ezê nûha ji diya te re bêjim ku ew te serbest bernedin, ezê giliya wan bi polîs re bikim. Ezê wan bidim tirsandinê, dê te berdin.

Newîn:

_ Ez qet texmîn nakim ku min berdin. Qet baweriya min bi wan tûne ye. Ji xwe bavê min ji dayika min re gotîty, em wê ji vir, ji Almanyayê bibin welat, li wê bebikê ji ber bikin û wê li wê bidin mêr, wê bizewicînin û bîn.

Seher:

_ Na!. Nebe, nebe tu bi wan re neçî. Qet beylû nabe, te bibin li wê û bêjin doza namûsê ye û te bûkijin. Bi wan re neçe. Ezê alîkariya te bikim. Emê çarêkê bibînin.

Newîn:

_ Erê min nekûjin jî, gava li wê min bidin yekê din, ew jî ji bo min mirin e.

Seher û Newînê hinek jî bi hev re axifiyan û Seher rabû, li derî xist, diya Newînê hat kilîtê deriyê odê vekir. Seherê, Newînê ramîsa û xatir jê xwest. Li aliyê ber deriyê derva, Seherê ji diya Newînê re got:

_ Ji mêrê xwe re bibêje, ger hûn Newînê ji hefsa odê bernedin, ezê biçim cem polîs û giliya we bikim.

Seherê van gotinan got û xatir ji diya Newînê xwest û çû.

Di nabeynê de du-sê roj derbaz bû. Seherê, Newînê nedît. Wê fam kir ku ew ji hefsa odê bernedane. Ji xwe diya Newînê tirsîyabû û newêrabû ji mêrê xwe re bibêjê ku hevala Newînê, Seher hatiye malê û bi hemû tiştan hesiya ye.

59

Roja çaran Seherê ji mala Newînê re telefon kir. Diya Newînê rahişt telefonê girt û bersîv da.

Seher:

- Alo. Ez Seher. Ha .. Xaltî tûyî. Ka we Newînê berneda. WeHa ezê biçim cem polîs.

Diya Newînê:

- Bise keçam, ezji te re rastiyê bêjim. Ez newêrabûmji bavê wê re bibêjim ku tu hatî cem Newînê. Nûha, ez bakim bavê wê tu bi xwe jê re bêj.

Seher:

- Başe, bake pê. Ezjê re bêjim.

Bavê Newînê hat ser telefonê. Seherê jê re got ku ew bi rewşa keça wî Newînê dizanê û ku keçikê ji hefsa odê berneda, dê biçê giliya wan ji polîs re bike. Bavê Newînê pirr aciz bibû. Di telefonê de bi Seherê re şer kir. Gote tu kî ye, çi heqê te heye tu tiliya xwe dixî nav tiştên me yên malbatiyê, kî ji te re gotiye ku min keça xwe hepis kiriye? Bavê Newînê bi hêrs van tiştan got û telefonê girt.

Bavê Newînê, ew şev bi jina xwe ra jî şer kir. Jina wî jî got:

- Weha nabe. Me keçikê hefs kiriye. Divê em wê berdîn derva, biçê nav hevalên xwe. Polîs pê bihesê dê serê me bikevê teşxelan.

Bavê Newînê, ew şev ji kerban raneza. Hetanî serê sibê xwe di nav ciyan de bir û hanî, kire ufte kuft. Serê sibê rabû ji jina xwe re got:

- Wê berde. Bila biçê sukê, nav hevalên xwe, hetanî ku em haziriya xwe biqedînê û wê bibî welêt.

Bavê Newînê ji malê derket çû karê xwe. Diya wê, çû derî vekir û ji Newînê re got:

- Keça min derkeve. Tu azad î. Here cem hevalên xwe.

60

Lê, me jî bifikire. Ev çibû te hanî serê me. Nebe nebe tu dînîtiyêk nekî, nerevî bi ciyêk va neçî.

Newîn:

- We min bi xêra Seherê re berda. Ku ew nehatana vir û bi vê rewşê agahdar nebana, we min bernedida.

Newînê nan jî nexwar û derket çû derve. Ewil çû Hans dît, jê re hemû tiştan qal kir û dawî got:

- Divê em çarêkî bibînin. Ya xwe vana ewê min bibin welat û li wê an min bukijin, anjî min bidin mêrekî kalepîr. Ew jî ji bo min mirin e.

Hans:

- Çira te bukijin? Ev çi tewir kultura (çanda) we heye? Newîn:

- Yê me ewaye. Bûye adet û anane. Ev tradîsîonêk e, jê re dibêjin namûs. Keç û jinan dikujin û dibêjin me namûsa xwe paqij kir. Namûsê bi xwînêrêtinê, bi xwînê paqij dikin.

Hans:

- Tiştêkî ecêp e. Li cem me ewropiyan tiştên weha tune ye. Keç an jî xort kî bixwazê bi wî/wê re dizewicê. Li cem we keç û jin qet azad nînin. Bi sedan, hezaran keç û xortên Alman bi biyaniyan re zewicîne. Binêre rojnama îroyî nivîsandiye; Keçikek Swîsrî bi yekê Kurd re zewiciye û paşê jî pêre çûye çiya, bûye gerîlla û li herêma Dêrsîmê hatiye kuştin.

Newîn:

- Belê, usane!. Ême, em jina hefskirî ne. Lê ez çibikim?

Divê em ji vê rewşa xwe re riyêk bibînin.

Hans:

- De bêje, em çibikin? Malbata te nahêlê em bi hev re bizewicin. Tu wan terk bikî û bêy cem min bijî, dê malbata te me rehet nehêlê, dê bîn lime bixin. Emê çawan

61

bikin?

Newîn:

- Di welatê me de gava ku keç û xortêk ji hev hez bikin û malbata wan qayîl nebin ku bi hev re bizewicin, xort, keçikê direvînê, paşê jî hinek şexsiyetên rûsipî dikevin nabeynê û herdu malbatan li hev û dû tînin. Lê yê me hewcê lihevhatinê nake. Ez dibêjim were ez û tu bi hev re birevin, ji vê bajarê biçin bajarekî din û li wê bi hev re bijîn.

Hans:

- Yanî, ez jî wek hemwelatîyên te ku dikin, te birevînim?

Newîn:

- Herê weHe! Min birevîne. Xeynê vê tu riyêk tûne ye. Hans li ser vê pêşniyara Newînê şaş mabû. Nizanibû çî bersîv bide. Got:

- Divê ez hinek bifikirim. Çend roj paşê ez bersîva te bidim.

Newîn:

- Çira çend roj paşê? Aniha bersîv bide. Qey tu ji min hez nakî? Bêje erê an na?

Hans:

- Ez ji te hez dikim. Lê, emê biçin kîjan bajar? Ku em biçin û paşê malbata te bên me li wê bibîn, dê çawan bibe? An jî ji bo ku min te revandiye, bav û birayê te bên min û te bukijin. WeHa ez ditirsim û ez naxwazim tiştêk bê serê te. Tu bêy kuştin ezê qehr bibim, dîn bibim.

Li ser mesela revandinê, çend roj di nav Newînê û Hans de bi mineqeşe derbas bû. Bavê Newînê bilêta firokê sitend ku sê roj paşê wê bibe welat. Newîn çû ji Hans re got:

- Bavê min bilête sendiye. Sê roj paşê min dibe. Tu min

62

www.netewe.CQ.m

direvînî an na? Ku tu qebûl nekî, hendî carekî din tu min nabînî, çavê te bi min nakevê. Ezê xwe bukijim, an jî ezê bi serê xwe birevim ciyek va biçim. Lê, hendî hew em hev û dû dibîn.

Hans mecbûr ma, qebûl kir. Ew û Newîn bi hev re reviyên çûn bajarekî din û li wê bi hev re jiyana xwe berdewam kirin.

* Ji pirtûka "Jin û Zîndan" çap: 1994 - Stockholm

63

A

BENDA ÇEPE TIRKAN NESEKININ!

Vê çîrokê pêşkêşê Kurdên ku di nav çepên Tirkan de cîh girtine dikim.

Malbata Harun ji ber sedemên aborî ji bajarekî kurdistanê koç kiribû, hatibun Îstebolê. Malbatekî feqîr bû. Di herêma Umraniyê de ji xwe re xaniyekî biçûk di şevêkî de lêkiribûn. Ji wan xaniyan re malê "gecekondu" (malên pişevdanî) digotin. Ew kesên ku di malên pişevdanî de dijiya, hemû jî feqîr û belengaz bûn.

Bavê Harun ji xwe re emeletî dikir. Keda xwe difrot, karên zor û zehmet dikir, xweydana xwe paqij dikir, ew çend kurişê ku kar dikirin pê malbata xwe, jina xwe û zarokê xwe xwedî dikir.

Di nabeynê da çend sal derbas bibû ku ew hatibûn Stenbolê. Bavê Harun ji ber karê giran ê emeletiyê bê hal ketibû, qels ketibû, nexweş bû. Ji ber feqîriyê, xizaniyê û neçariya aborî ew hendî nikaribû Harun di dibistanê de bide xwendin.

Harun dev ji dibistanê berda bû û ji bo alîkariya malbata xwe bike li ber qehwê kar dikirin. Karê qehwê hemû di hustiyê Harun da bû. Wî hem çay çêdikir, dezgecîti dikir, hem jî çay û qehwe belavdikir. Marqecîti dikir. Mirovên şoreşger yê herêma Umraniyê hemû dihatin qehwa Harun. Ji wan şoreşgera çend kes hevalên Harun yê dibistanê bû. Ewan bi Harun re têkilî danîbû, pirtûk û kovar didan Harun, wî jî vana dixwendin.

Piştê demêk Harun jî bibû hevalê wan şoreşgera. Di herêma Umraniyê da rêxistinî çepê Tirka hebû. Harun bi eslê xwe kurd bû, lê di nav rêxistinêkî Tirka de cîh girtibû.

64

Harun bi xwendina pirtûka zanatiya xwe pêşta biribû. Wî hendî bi hêsanî. bi kesên rêxistinên din re li ser pirsên siyasî mineqeşe (genqeşe) dikir.

Demêkî dûr û dirêj derbas bibû. Di nav pêvajoyê de Harun bi kurdîtiya xwe ve qelibû. Wî vêca giranî dabû pirtûkên li ser pirsên mîllî (netewayî) û wan pirtûka dixwend. Harun li ser pirsên netewayî ya kurd bi hevalên xwe re, bi endamên rêxistina xwe re jî mineqeşe dikir. Hevalên wî yê rêxistinî jê re digotin:

- Pirsên netewî (mîllî) talî ye. Pirsên eslî a çînayetî ye. Ku em şoreşê bikin, wê gavê emê heqê kurda bidin. Kurdên ku di nav rêxistinên çepê Tirka da ne û xaseten yê ku di nav rêxistina me de ne, ji bo ku ew entemasyonalîst in, loma di nav rêxistina me da cîh girtine.

Harun demêkî dirêj bi van dîtinên hevalên xwe û rêxistina xwe bawer kir, xwe bi van dîtinan xapand. Di nav wê dema dirêj de rêxistina wî çî kar da pê, wî kir. Hemû wezîfên ku rêxistinê da pê, bi cîh anî.

Rojêk wek her rojî, Harun hat malê, dît ku kurê xalê wî Dara hatiye mêvaniya wan. Harun xêrhatinê lê kir, bi destî wî girt, hev û du maçî kirin. Ev bibû çend sal bû ku Harun, Dara nedîtibû. Dara çiqas mezin bibû. Tam bibû xortekî temam.

Dara ji bo karekî xwe hatibû Îstebolê û piştê heftêk yan deh rojan dê vegeyana Kurdistanê. Dara xortekî şoreşger û zana bû. Wî û Harun li ser pirsên siyasî û pirsên mîllî ya netewa kurd bi hev re pîr mineqeşe kirin. Dara ji bo mesela kurd û Kurdistanê rexne li Harun digirtin. Harun dîtinê

rêxistina xwe diparazt. Lê Dara van dîtinan çirûk dikirin, xeletî û tewşîya ditina rêxistina Harun dadaniya holê.

65

Axaftina Harun bi Dara re û rexneyên Dara di serê Harun de pirr pirs çêkiribû. Di mineqeşan de Dara ji Harun re digot:

- Tu kurd î, lê tu Kurdistanê nas nakî, rewşa gelê kurd nizanî. Çavê te kor e, perde kişiyaye ser, tu pirs netewa xwe nabînî. Xêra rêxistinên Tirka ji gelê kurd re tune. Ew nikarin gelê kurd rizgar bikin. Rêxistina te û hemû rêxistin û partiyên çepên tirk dibêjin ku em şoreş bikin, emê heqê gelê kurd bidin. Baş e, ku ew şoreş nekin dê çawan bibe? Gelê kurd ji bo destxistina heqê xwe dê benda wan bisekine. Ev dîtinekê çewt e. Ev dîtin bi eşkera ji gelê kurd re dibêjê, dengê xwe nekin, benda şoreşa me bisekinin. Bu heftê (70) sal e çepên Tirka şoreş nekirine, nûha pêve jî nikarin bikin. Çepên Tirka (çend îstisna ne tede) hemû jî sosyal şoven in. Duvika kemalîzmê ne. Ew nikarin gelê kurd xilas bikin. Rizgariya gelê kurd bi destê gelê kurd e. Ew ancax bi hêz û quweta xwe xwe rizgar bikin. Gelê kurd benda wan nesevaniye û nasekinê jî.

Van gotinên Dara li ser Harun pirr tesîr dikirin. Ji xwe gava Dara diaxifiya, te digot qey wî zanatiya îlmî xitim kiriye û ew pîsporê pirs netewayî ya milletên (netewên) bindeste.

Ev roj Harun neçubû kar û ji Dara re got:

- Tu mêvanê me yî, min te di bajêr de negerand. Îro ez naçim kar, emê bi hev re biçin di bajêr de bigerin.

Herdu jî bi hev re çûn, di nav bajêr de tîr û tijî geriyên.

Paşê reht bun, çun di nav parqê de runiştin.

Herduya bi hev re vir de wê de axifiyan, ji hezar kaniyan av hanîn. Paşê Dara gotinê hanî ser pirs rêxistinî ya siyasî û ji Harun pirs kir:

- Harun, tu kurd î, ji bo çî te di nav rêxistina kurda de

66

cîh negirt û tu çûy ketî nav rêxistina çepê tirka?

Harun:

- Ez ji bo ku şoreşger im û enternasyonalîs tim, loma min di nav çepê tirka de cîh girt.

Dara:

- Çepên Tirka te û yên wek te bi sedan kesî, mirovî bi van dîtînên çewt dixapînin. Ma qey çepê kurda, rêxistinên wan şoreşger nînin. Ew jî şoreşgerin.

Enternasyonalîstî jî tapuyê bavê çepê tirka nîne. Divê ewil mirov ji bo rizgariya gelê xwe xebat bike. Tu û rêxistina te ji bo xilasiya gelê kurd çi kiriye? Kurd biçin di nav rêxistinên çepê Tirka de cîh bigrin dibin enternasyonalîst! Başê, ma çima Tirk nayên di nav rêxistinên kurda de cîh nagirin?

Harun:

- WeHa tu heqliye. Divê mirov ewil ji bo rizgariya welatê xwe û azadiya gelê xwe kar û xebatê bike. Min di serî de xeletî kir, ku min di nav rêxistina tirka de cîh girt. Lê ezê ji wan veqetim. Ji nûha pêve ezê ji bo gelê xwe bixebitim.

Dara û Harun rabûn çûn malê. Roja din Dara vegariya çu Kurdistanê. Harun jî di nav wê heftê de ji rêxistina xwe veqetiya. Hevalên wî yê rêxistinî li ser veqetandina wî, jê re gotin:

- Ji xwe ji we kurdan sosyalîst dernakevê. Hûn hemû miliyetçîne.

Harun jî ji wan re got:

- Miliyetçîtiya me ji sosyalîstiya we baştir û pêştatir e.

Di eslê xwe da hûn sosyalîst nînin, hûn sosyal şoven in. Dewlemendên we axa û beglerên me xapandin û dixapînin, çepên we jî karker û gundiyan me, xwende-

67

vanên me dixapînin. Gelê kurd 70 sal benda we sekinî, we tiştêk safî nekir. Hendî em benda we nasekinin. Bese we me xapand. Hendî emê bi hêz û qeweta xwe têkoşîna xwe bidin. Hûn neyartiya gelê kurd nekin bi gelê me re dost bin bes e. Emê her tim destê dostaniyê dirêjê gelê Tirk bikin.

Harun piştê ku ji rêxistina xwe a çepê Tirka veqetiya, çû di nav rêxistinêkî kurd de cîhê xwe girt û dest bi kar û xebata siyasî kir.

* Ji pirtûka "Torina -Neviya- Şêx Seîd - Ev pirtûk paşî bi navê "Bayê Azadiyê" cara duyem hate çapkirin. "çap: 1993

SERBILINDI

1

Mahmûd di qehwê de runiştîbû, ew û çend kesên din bi hev re diaxifiyan. Postecî yê ku name belav dikir çû ket hundirê qehwê û çend kesên ku wan dinasiyan, namên wan da wan û çû cem Mahmûd silav lê da û jê re got:

- Ji Îstenbolê ji te re birûsk (telgraf) hatiye ka li vir îmze bike û birûska xwe bigre.

Mahmûd îmze kir û kaxida birûskê girt.

Lê, ew ji xwe re şaş mabû. Kî ji Îstenbolê jê re birûsk şiyandibû? Gelo çima şiyandibû?

Xwendin û nivîsandina Mahmud tunebû, lê wî kur û keça xwe dabû xwendinê. Mahmûd kaxiza birûskê kir berîka xwe, xatir ji wan mirovê ku li cem wî bûn xwest û rabû berê xwe da mal. Mahmûd nexwest ku birûskê bi mirovekî din bide xwendinê. Keça wî di malda bû û xwendina wê hebû. Loma lez kir çû mal û ji keça xwe re got:

- Keçê, ka were, ji Îstenbolê birûsk ji min re şiyandine.

Han binêre, bixwîne hela çi dibêje.

Keçika Mahmûd birûskê girt, xwend û hêstiran di çavên wê da kir xwarê, giriya. Mahmûd meraq kir, diltengiyek wî girt û ji keça xwe pirs kir, got:

- Tu çi re digirî, çi dibêjê, tiştêkî xirab buye? Keçik:

- Bavo, ez dibêjim qey tiştêkî bi serê Kendal de hat. Di birûskê de dibêje kurê te di nexweşxanê de ye, mesekine were.

Li ser vê agahdariyê bihna Mahmûd hinek jî teng bû, doxa wî çû. Ew li ciyê xwe runişt û ji keça xwe re got:

69

- Çi karê Kendal di Îstenbolê de heye? Ne bi min ew çibû çiya, ketibû nav qada şerê çekdariyê. Kendal di çiya da çû, di Îstenbolê da derket. Îcar çira wî birine avêtine nexweşxanê? Nexweş e, birîndar e, yan hatiye kuştin? Meriv nizanê! Gelo ji çiya çira çû Îstenbolê? Reviya çû wê derê? Hema na! Kendal yê revê nîne.

Keça Mahmûd:

- Bavo, tu çi dibêjî? Kes Kendal bi zor nebîr çiya ku bireve. Kekê min Kendal di riya bîr û bawerîya xwe de, bi dil û can, ji bo rizgariya welatê xwe çû çiya. Ez dibêim rêx-istinê wezîfe da pê û ew şiyand Îstenbolê. Loma ew çû wê derê.

Mahmûd:

- De xwezî bila wiha be. Divê em hema cî de lêxin biçin 'Îstenbolê.

-2-

Rêxistinê wezîfe dabû Kendal û ew şiyandibû Îstenbolê. Wî di nav çend mehan de kar û xebatekî hêja kir. Ew qet vala nedisekîniya. Kendal bi hevalê xwe ve di hemû çalakiyan (eylem) de cîh girt û wan bi gelek çalakiyan di hêla aborî da pîr zerar û zîyanê dan dijmin û ji dijmin gelek kesan kuştin. Cara dawî kemînek (pusu) avêtin pêşîya otobosa serbazan, ji wan pîr kes kuştin û birîndar kirin. Kendal û hevalên wî şerê gerîlatiyê a nav bajêr bi hostatî dimeşandin. Wan bi çalakiyên xwe tirs û xof xistibûn dilê dijmin.

Dijminê xwînxwar dawiyê bi qeleşî, di parve da gule berdabû Kendal, wî birindar kiribû û ew girtibûn biribûn îşkencexanê û pê şkençe kiribûn. Lê polîs tu gotinek ji

70

devê Kendal negirtibû. Polîs kiribû nekiribû, nikaribû wî bidin axaftinê. Kendal di berxwede dida, serê xwe ji wan re xwar nedikir, li ruqalê wan barbaran tim û tim serbilind bû.

Polîs ji Kendal re digot:

- Tu hêj ciwanî, jiyaneke xweş li pêş te heye. Tu çima buyî terorîst û cudaxwaz?

Kendal jî bersîv didan wan polîsên hov û ji wan re digot:

- Hun qala kîjan jiyana xweş dikin. Gelê kurd di tu demê de jiyaneke baş û xweş nejiya ye. Ev jiyana a mirî ku dijmin spartiyê gelê me, dîlîtî (esîrayî) û stuxwarî ye. Em dixwazin serbilind û serfiraz bijîn. Îro civaka kurd, qeyd û zincîrên bindestî û koletiyê dişkîne.

Di îşkencexanê de rewşa Kendal xirab bibû, hatibû ber mirinê. Polîs mecbûr man, ew girtin birin nexweşxanê. Lê di nexweşxanê da kes qet lê

mêze nekir. Dixtor mirovekî paşverû, faşîst û neyarê gelê kurd bû. Ewan derb û birînên Kendal derman nekirin. Piştê heşt deh saet derbas bû, dix-torekî din hat li halê Kendal mêze kir ku ew li ber mirinê ye, gote emê wî ameliyat bikin. Îşkencyên mezin û giran ameliyata wî bû. Wan narkoz nedan Kendal û wî ji xwe de nebir in. Bê narkoz ew ameliyat kirin. Zilm û zordarî, nemirovahî û barbariya dijmin di nexweşxanê de jî xwe nîşan dabû. Piştê ameliyatê Kendal hinek baş bû. Roja sisiya savciyê dadgehê hat li nexweşxanê îfadê Kendal girt. Kendal da diyarkirin ku polîsan bi çi tewirî pê îşkence kirine. Lê qet xema sawcî nebû ku bi Kendal îşkence kirine an na. Sawcî ji Kendal re got:

- Dev ji çîroka îşkencê berde. Ka bibêje hûn çi dixwazin, dawa (doza) çi dikin?

71

Kendal:

- Baş e em îşkencê bidin aliyek. Em li pirsra te mêzekin.

Tu jî dizanî ku em dawa (doza) çi dikin. Lê hesabê te/we nayê. Dîtin û daxwazên me di raya giştî û alemî de tê zanîn. Lê ez bi kurtayî çend tişt ji te re jî bibêjim. Gelê kurd ji xew hişyar dibe, êdî ew naxwazê ji gelên cîhanê yên pêşketî kêmbimîne. Gelê kurd li welatê xwe, li Kurdistana xwe ya dewlemend xwedî derdikeve. Armanca me azadî û serxwebûn e. Em ne dildar û evîndarê xwîn rijandinê ne, yên ku xwîna me dimijin û jiyanê li me kirine zindan, divê baş bizanin ku êdî em xwîna xwe bi wan nadin mijandin. Bindestî; tarî û tarîstanî ye, koletî ye, hêsîrî ye, belengazî ye, xîzanî ye, nezanî ye, bê rûmetî ye. Riya ji bêxîretî yê xelasbunê, li têkoşîna neteweyî, azadî û serxwebûnê xweyî derketin e. Ev serbilindiye. Azadî û serxwebûn li tu devereke dinê, li ser sêniyên zêrîn ji gelan re nayê pêşkêşkirin, ew tîn stendin. Ev maf nayên dayin, bi xebat û têkoşînê tîn stendin.

Kendal hêja axaftina xwe neqedandibû, sawcî aciz bû, ! hêrs bû û rabû serxwe got:

- Bes e! Ji min re nûtûq mavêje, cehenema te kim, çi halê tu têdayî bibîn e.

Sawcî çû derve, dixtor dît. Ew bi hev re axifin û çend saet paşê polîs û du leşker (asker) hatin Kendal girtin bi wê halê wî û birîna wî ve ew birin kirin zindanê. Kendal bi wê halê xwe yê xirab ve li zindanê serê xwe li ber dijmin xwar nekir. Kendal bi hef siyên siyasî re di berxwedanê de cîh girt, ket greva birçîbunê. Piştê du hefte birînê wî xidar bû, xwîn ji laşê wî hat, ket ber mirinê, ew rakirin birin nexweşxanê.

72

-3-

Mahmûd piştê ku biruskê (telgrafê) girt, ew û keça wî Gulê çun Îstenbolê. Di Îstenbolê de ew çûn hemu hepîxane û nexweşxanan pirs kirin, lê cîhê ku Kendal têda bû nehewisîn. Piştê çend rojan nexweşxana ku Kendal têde radizan hewisîn. Lê vêca polîs û askerên ku li ber oda Kendal novedar bûn, nehêştin ku ew Kendal bibînin. Mahmûd û keça wî bi saya hinek nas û dostan çûn xwe gihîştandin hevalên Kendal ên ku li bajarê Îstenbolê bûn. Hevalên Kendal rewşa wî ku çawan birîndar ketiye, ji Mahmûd re qal kirin û gotin:

- Avuqatê dawa wî heye. Avukatjin e û dostê Kurdan e.

Herin ber wê, ew dikarê îcaze bigrê, da ku hûn Kendal bibînin.

Roja din, serê sibê Mahmûd û Gulê çûn ba avukat.

Avukat dil da ber wan, ji wan re pîr alîkarî kir, îcaza hevûdu dîtî girt û bi Mahmûd û Gulê re, hersê bi hev re çûn nexweşxanê. Li devê derî kaxidê îcazê bi polîs û serbaz nîşan dan.

Serbaz got:

- Ez û polîs û hûn, emê bi hev re biçin cem wî. Divê hûn li ba me pê re biaxifin.

Avukat:

- Hûn ji bo çî bi me re tên? Hûn li ber derî bisekinin, emê biçin hundir pênc deqe wî bibînin û bên derve. Ji xwe kurik birîndar e, nexweş e, di halê mirinê da ye. Bihêlin bila bav û law (kur) ji xwe ra bi dilxweşî bi hev re biaxifin.

Serbaz qebûl nekir û ew û polîs bi wan re çûn hundir.

Mahmud çû ku xwe avêt kurê xwe, wî hemêz kir, eniya wî maçî kir û giriya. Gulê jî çu kekê xwe Kendal maçî kir,

73

hêstirê çavên wê wek baranê hatin xwarê. Avukat jî bi destê Kendal girt pirs a wî kir.

Kendal ji xweşka xwe û bavê xwe re got "megrîn." Girîna wan sekinî, lê Mahmûd melûl bû, kezeba wî dişewitiya, serê xwe xwar kiribû. Stuxwarî, rebenî û neçarî ya Mahmûd xuya dikir. Kendal gava vê halê bavê xwe dît hêrs bû û bi kurdî ji bavê xwe re got:

- Bavo! Li ber van dagirkeran stuyê xwe xwar meke.

Serê xwe rast bike. Serbilind be.

Ser vê gotina Kendal di cî de Mahmûd ji xwe ve veciniqî, xwe rast kir, serê xwe rakir, serbilind bû. Avukat ji bo ku bi zimanê Kurdî nizanibû, meraq kir, ji Gulê pirs kir, got:

- Birayê te, ji bavê te re çî got ku weha xwîn ket ruçikî û serê xwe dîk kir.

Gulê gotinê Kendal ji Avukat re bi Tirkî got. Avukat çû eniya Kendal ramîsa û ji Gulê re got:

- Ji bavê xwe re bibêje, kurê wî xirûr û xîreta wî û a milletê (netewê) wî ye. Kendal bi vê mêrxasî û qehremanî (lehengî) ya xwe serbilindiya gelê Kurd e.

Piştê çend deqîqan, ewan xatir ji Kendal xwestin û der-ketin çûn. Kendal çend roj di nexweşxanê de ma. Lê dix-toran lê mêze nekirin, birînê wî derman nekirin. Çend roj paşê Kendal çû ser heqiya xwe, ket nava karwanê şehîdên Kurdistanê.

Bavê Kendal, Mahmûd cenazê kurê xwe yê serbilind girt bir navça (qeza) xwe Pasurê (Kulpê). Li Îstenbolê bi hezaran welatparêzên Kurd Kendal uxir kirin. Di qeza Pasurê (Kulpê) da hemû esnafan dikanên xwe girtin, gelê Kurd bi yek dengî û bi yek dilî li pey cenaze meşîyan ta qebrîstanê. Kendal kirin mezel û ji bo wî û hemû şehîdên

74

Kurdistanê bi hurmetî rêzgirtin, rawestiyan.

Hevalên Kendal di kovar û rojnameyên welatparêz da li ser têkoşîn û jiyana Kendal a şoreşgerî nivîs nivîsandin. Hevalê wî yê girtîgehê Abbas li ser navê welatparêz û şoreşgerên girtîgeha Saxmalcîlarê daxûyaniyekî weha di kovar û rojnamê da weşand.

"Kendal,

Polîsên vê sîstemê (sazumanê) nehiştin tu tedawî bibî û
tu şehîd buyî. Em te bi hûrmet bi bîr tînin.

Em Kurd in

Warê me Kurdistan

Sonda me bi navê şehîdan Banga me li dost û neyaran

Bes el 'An Kurdistan an neman"

* Ji pirtûka "Ey Şehîd, Hey Hebûn" - çap: 1993

75

Lokman POLAT û Berhemên Wî

Lokman Polat di sala 1956an de, li Licê - qeza Diyarbekirêhatiye dinyayê. Ew çend car hatiye girtin û berdan. Di dawî de di giyaba wî de deh sal û nîv ceza dane pê. Wî beriya sala 1980yê li welat belavokên siyasî û nûçeyên siyasî dinivîsand. Di sala 1984an de ew _ hatiye Swêdê. Li Swêdê dest bi nivîsîna kurteçîrokan kir. Gelek kurteçîrokên wî di rojname û kovarên curbecur yê kurdan de hatin weşandin.

Hetanî niha 27 pirtûkên wî derketine. Ji wan 3 heb bi tirkî ne, 24 heb xweru bi kurdî ne. Pirtûkên bi kurdî 8 roman û kurteroman in û 8 pirtûkên kurteçîrokan in. 5 pirtûkên lêkolînê ne û 3 pirtûkên helbestan in. Lokman Polat ji bo zarokan jî 3 pirtûk wergerandiye kurdî. Lokman Polat kovara kulturî û lîteraturî Helwestê jî weşand. 12 hejmarên kovarê derketin. Wî bi navê Kewa Marî, Fîlozof, Rojnamevan, Robîn û Qod Nav Viyan romanên balkêş nivîsiye û weşandiye. Ew niha romannivîseriya xwe didomîne.

Lokman Polat di destpêka damezrandina Komela Nivîskarên Kurd de cîh girtiye û bûye endam û endamiya wî ya komelê hêj jî berdewam dike. Lokman Polat xwediye weşanxaneyê Helwest - Çanda Nûjen e û berpirsiyarê kovara Helwestê ye.

Helwest Forlag

76

BERHEMENLOKMANPOLAT

YEN ÇAPKIRI:

Kurteçîrok

1 - Evîn û Jiyan 2 - Bayê azadiyê 3 - Mêrxas

4 - Jin û Zîndan 5 - Evîndar

6 - Xwîn û hêstirên çavan 7 - Ey Şehîd, Hey Hebûn 8 - Gulîzar

Roman û kurteroman 1 - Kewa Marî

2 - Fîlozof

3 - Rojnamevan

4 - Narîna Nivîskar 5 - Robîn

6 - Hawar û Qêrîn 7 - Nûrheyata Licî 8 - Qod Nav Viyan

Helbest

1 - Helbestên Sirgûniyê 2 - Dîwana Dilperîn

3 - Helbestên Şadimaniyê

Lêkolîn / Nirxandin 1 - Ji nav edebiyata

Cîhanê

2 - Ji nav edebiyata Swêdê 3 - Bandora Edebiyatê

4 - Bîst Romanên Kurdî

5 - Westayê peyv û

hevokan Shakespeare

Yên tirkî

1 - Barbar Kasirgasi - Kisa Oykûler

2 - Baş egmeyen bir KURT devrimcisi

3 - Kurdistana Sor (Kafkasya Kûrtleri)

Yên ku derkevin:

1 - Axîna Licê

2 - Kaniya Stockholmê

3 - Paradîs - Xweşiya heft rojan

77

**

ÇIVÎKÊN BERAVÊTÎ

Pîr RUSTEM:

pirustem@scs-net.org

Kurteçêrok

Ji...

YARA re.

KILÎT

Eger em bi nirîneke panoramî li rewa çêroka nûjen, di cîhanê de, binirin
tê

diyarkirin ku, ev celebê toreyî yê xweik; Çêrok li hember serhildana
celebên

toreyî yê din nemaze helbest tim di bin barê zor û setemê de dimîne.

Toreya me jî ji vê rewa ha ne dûr e, lê belê ne titekî veartiyê ku, toreyê
paxana (nesir) kurdî -bizaravê Kurmancî- bigelemperî qelse û bi taybetî
di

warê çêroka nûjen de. Tev ku, çêroka nûjen di cîhanê de ciyekî bilind û li
ser

destê çend “Bavên” hêja û bi deng wek Çîxov – Rûsiya. Mopasan –
Feransa.

Alan Bo – Emerêka, sitandiyê. Dahênan û afirandinên wan bûn bingeh ji
her

çêroknivîsar re.

Li her derê, roj bi roj, nifên bi dû wan re li ser pêvajoka çêrokê berdewam
kirin. Li cem me kurdan jî, digel vê bingehê re, zargotina me jî di warê
avakirina çêroka kurdî de – ya nûjen – stûneke din girtiye, tev ku çend
nav

dihatin nas kirin -Bavê Nazê- mînakek hêjaye, lê bingehê çêrokî
serbixwe

nehat meydanê. Ji ber vê yekê jî rêya çêroknivîsên me yê nû çetin û
dijwartir

bû, Pîr Rustem jî di vê pirtûka xwe ya pêîn de bi hêz dide ser vê riya bi rûmet,
û berhemên “Çivîkên beravêtî” navê xwediyê xwe dixê rêza çêroknivîsan û wî
dajon ser rê, pênuşeke din ê nû, bi hiner û nûjen li ezmanê toreyê me diçirisîne, cîhana çêrokî, di vê pirtûkê de, bi zimanekî nerm û jiyânî saz dibe, bi
ketinheva navbera xewnê (kabûs) û rewşa jiyânî de, navbera bawerî û ne baweriyê de, navbera dîtî û ne dîtî de. Bi vî awayî bûyarên jiyânî di pergaleke
beravajî de bilind dike, pergaleke fantastîkî, sîberî, xewnî, ji bo afrandina risteke çêrokî sax û xweik.
Xewnên beravêtî ji kesên çêrokan re dihêle ku, jîna wan kesan berbavêje.
Bi
sedema hikbûna kevir û hîmên zor û reiya ku, têde dijîn, li ber siya hilweandina daxwaz û hêviyên wan di rêya rizgariya mirovayetiya wan ya ku,
hatiye dizîn û talankirin. Ji ber wilo em matmayî namînin li ber bilindiya bejna
dêwên mirinê, di ezmanê çêrokan de. Mirin ji her hêlên ezman dibare; Bi sawek
giran, xwekutî-mirîna erzan, “bi trimbêlê”. Mirîna dev bixwîn “bi kurtinê,”
mirîna bi çekên qedexê “bi xerdel”. Mirîna bi awayakî Kafkawî , ji ber ku, tayê
navbera mirin û jînê wînda dibe, eger ne windayî be!..
Bi vî rengî nivîskar dest datîne ser giringiyê, ser (cewherî) bi sazkirineke hinerî

jê re. Ev tit ciyekî girîng dide van çêrokan di rêça çêrok û toreyâ kurdî de
ya
ku, demeke dûdirêj di bin qamçiyê “îdyolociya” û rola wê ya wêran de
hejar û
bê can ma. Em dizanin ku, gotina hinerî dikare îdyolociyekê hilgire, lê
girînge
em venasin bi westandin û bêçarebûna gotina îdyolocî ya ku, ti carî nikare
rahêje gotina hinerî û eve ya girîng ji me re, di vê ajotiyê de. Her mirov li
babetên nû digere, lê babet çibe ne zirareke mezine. Belê .. . Bi çawatiya
nivîsandina wê babetê, buha û nerxa nivîsara toreyî tê naskirin.
Pêwîst e îro ne siba em ala “hier”, bi merama wê ya durust, hildin jor, di
gerdûna toreyâ xwe de. Bi rastî, nizimbûn an bilindbûna vê alê nîana
nizimbûn an bilindbûna gelê me ye.
Ma ku, em bêjin çêroknivîs “Pîr Rustem” sala 1963 an ji daykê bû û hat
vê
“dojehê”, li hêla “Cindirês” ê, ji herêma “Efrîn” ê. Ev pirtûk mîna kilîta
xaniyekî di nav mij û dûmanê de hatiye çandin, gelo ev xanî çawaye, xwe
û
xweike, an na. Bersiv di hembêza çêrokên Çivîkên BERAVÊTÎ de ye. Ka em
bi
hev re, bi du çavên iyar, bixwînin.
Ebdul Helîm Yûsiv
Amûdê-ş ibat 1992.
DÎWAR
“ -Lêdim .. nedim. Derî girtiye, lê dengê Keçan, di nav dengan de nakim.
Lêdim .. . Belê, karin ji min re bêjin: Piçek din bê. Bawer nakim; Di rûyê
min
de .. bigrin.”

Bi lêdana derî re, ji rew û ramanên xwe iyar dibe, dudiliya xwe birîbû. Bi dîtina rûyê xwediyê malê re, hunava wî ya dikelî, vedimire.

-Êvar xwebe bavê Memo. Gotinin mirî dertên.

-Xwedê xêra te bide. Bes tit tinebe ku, wilo bihêle di nîvê evê de, li derî bide. Eyaz di nav gotinên wî de; Tu ji ku hatî vegere wir, bihin dike û serî bi ser

milan de xûz dibe.

-Netirs .. tit tineye. Kenekî zer di kûraniya mêjî de îndide. Cixarên min neman û min dît .. hîne wîn iyarn. ..

-Nexeme .. . Sê-çar cixare besin. Ji berî Eyaz gotina xwe bibe serî, bavê Mamo

rê li pê birî û çend cixare xistin destên wî.

Ji sê-çar salan ve, Eyaz ê Kendo hatiye Heleb, bi sedema xwendina bilind.

Lê

mejiyê zanîni û canê Eyaz yê mozîkî, ererkî giran, di nav du salê dawî de, bi

hev re dikirin û li dawiyê xwandina zanîngehê Berdide; Dibe agirtek ji yên ûnstûda mozîkê û bi sedema vê yekê, têkeliya wî bi mal re, tête birîn.

“ -Tu yê nuha bi kuve biçî. Sê-çar cixare .. dirav di beriya te dane, ne mal.. mirov.. dost. Sipasiya te digrim bavê Memo. Sê-çar cixare, wê piçek hi bi mejî de berdin.”

Dûyê cixarê, op û ramanên Eyaz, di tariya evê de winda dibin. Pireya “Şeê Çiriya Pêin” dihêle ku, dengê tirambêlan, bombeyan di serî de biteqîne.

Jîna

çar salan, wêneyên perîani.. miextî, ji çavan bi weînin. Dengê xortê ku, di evbêrkê de bervedaniyeke bijartî, di ber qelsî û kêmaniyên sazband û torevanên kurd dikir û girêdana nezanîna wan bi rewa wan û millet ve, lêdide.

-Belê.. ji bîr neke ku, mîletê te ji evqas sal de di bin nîrê dijmin de ye. Tu çawa dixwazî ku, torevanê Kurd li gor yê firansî be. Xort bi dilewatî ji Eyaz re

dibêje.

-Bes li gor roja îro û alavên agahdariyê yên di nav bera mîletan de, dihêle ku,

mîna te gotî; Zemîn bibe gundekî biçûk û mêjî.. raman.. nîrînên xwe zelal û

xûya derîne. Eyaz gote xort.

-Ev alavên tu dibêje, di destên kêde ne. Ma rê li pê yê Kurd vekiriye; Çi ji xwendi .. zanîn û weandinê. Lê erê wî tête kirin.

-Ev gi jî rê nadin yekî ku, nezanbe û ez karim ji te re çend nemûneyan bînim. Ka ji min re, sedememekê bîne, çima M.E. kerîm û S yosêf, dê ne li gor

hevbin û ji kevin de, em xwedî awaz û sazîn. Dibêjim: Eger yek xwe bi êîne,

ne bes wê di pê yê Ereb da be, heya pê yê Ewripî jî. Lê em, tim û tim, xwediyê Gotina; “Her titî, ji xwe û berê, dizanim.”

-Tu xwe di ser pir bendan re davêje û ji bîr dikî ku, pêketina mîletan, gav bi

ga. ..

-Bese.. me ji van gotinan têr xwar û tim jî birçî û xizanin, cîhan li kûye û em

li... Lêdan, reqîn û ronîya birûskê dihêle wêneya Dilan ê, di devê derî de, bida xûyakirin. Eyaz du-sê caran çav misdan ku, ramanek rasteqîn ji mêjî bistîne û leylana Dilan ê vegeerîne kûraniya dil û hunavan, lê mixabin bi bîstina navê xwe, dengê wê dinase û hejandina destan dibîne.

“ -Çima.. tu li bin baranê sekiniye, çima.. nayê hundir, tê vê evê biçu ku..

were li vir.. raze..”. Eyaz bi qelsî gav avêtin, lê dema dît wêneya wê, ji ber çavan winda nabe, xwe lê girt û bi hemû hêza yar û dilovanan, rê û gav, birçî û

perîanî, ol û edetan dibire, berve Dilan ê dibeze, deng û ronîya birûskî, di çavên Eyaz ê Kendo de ne, dilopên baranê û xwîna ji eniya wî têtê xwar, dibin

yek, ..û wêneyên Dilan ê, hêdî-hêdî, di çavên wî de vedimrin. Heleb-91
SILAVA

Bi teq-teqa pêpelokan re, Xemgîn serî ji rûpelên pirtûka li pê xwe radike;
Çav

reantiyekê digirin û berkeniya Silava ji pit bi dertê, silav da û ber bi hundir verêbû. Xemgîn xortekî xwendeye, îsal di sefê xwe de mayî û ew anha karê

nivîskariyê li xweringehê dike.

“ -Xweda.. ez di çi agirî de me, ti kes wek min hej vê keçê nake, lê kesin din

meyweya rezê wê dixun, ev bê rûmetê.. ”. Hîne ew ji dîtina Silava iyar nebûye û ramanên wî mîna dûpikan ji çalê dkiin, dengê wê ji hundir ve hat

û gupikine nuh di dilê Xemgîn de pikufandin.

-Tu çawayî Xemgîn.

-Ser lêv.. ser çava, çav dîsa bi xala ser rû-dêm dikevin, bawere ger çiqwas ox

û engî, li ba Xwedê hebû, wî nivî da xwîn û rû-dêmê Silava û nivê din xala wê.

-Xemgîn tu ji bîr nekî, min duh wîn teklifî xwerina nivro kirin, bi gotinên wê

re, hevalê wê jî dighe ba wan.

Şeva çûye, dema ew bi telîfonê bi Silava re axifî û henekên xwe dikirin û kenê

wî dilê Xemgîn kêr dikir, di nav gotinên xwe de jê xwest ku, sibehê li xwaringehê hevdu bibînin, lê dive xwarin li ser wê be. Gotin, gotinan tîne û

mazovanan jî hev anî, bê soz Xemgîn bû yek ji wan.

-Merheba Silava, weke min got: Ji duhunî ve min xwarin ne xwariye. Ji berî

hevalê wê bê, Xemgîn di navbera xwe de ge got: “Ev keyseke ku, bi tena xwe li

xala wê binerim, bê ku, kes çavên xwe di min de bebeloq bike”. Lê hêviya wî bi

cih nehat; Merheba Xemgîn, tu zanî Silava wê me teklifî xwarina selete û humsa ke.”

-Hema çibe ne xeme, gotina Silava, bê teklif li ba min buhaye. Silava li çavên

hevalê xwe nerî û biirî, wî jî guhê xwe xist ber yê wê, ka di telîfonê de çi diaxifin; Di dema ku, hevalê wê bi Xemgîn re ketibû wê axaftinê, wê jî têlêfonek

vekiribû.

Xemgîn dît ku, hilmên wan dikeve devê hev. Xwest bilive, bike qîrîn, lê wek

kesê dest û lingên wî hatibin girêdan û dev tijî pembo kirine, deng jê nehat.

Vebiriqandina hesinê kêrê, hêdî-hêdî nêzîk sîng dibe, xwe berdide dil; Xew û

xewneke giran li ustû nîtî, nikare têde bilive. Bi kenê wan re iyar dibe û siya wan di hundirê xwaringehê de vedimre.

Xemgîn çav damrandin. Siya wan mezin bû û bû, cîhan tev girt; Ewrekî re, royê wenda dike, lê birûskek hilat û baranê qad û asûman ût. Ewrên re jî ji asûman windabûn û rengê în-sayî belavbû, bihna axê hilkelî û ji dûrve, Silava ber bi wî dibeze. Xunava ser sosinan xwe bi rehên wê ve girtine ku, yek

ramûsanana jê bistînin, tîrêjên royê Jî dane pey wê.

Xemgîn per û balêt bi banî de davêje, zendan dihejîne û ber bi hev dibezin. Lê

det nayê birîn, ji dema (Lolo û Kaiyon) de, heya roja Yara û.. dibezin, lê ev dûrîtî nayê birîn û ji nikava, weke ku tit li cem çêrokvanan dibin, ew dighên

hev.

Zendên Xemgîn kembera nava Silava ye, ew jî û bi danîna tiliyên xwe ser milên

wî, êa salan dirjîne û mîna gergeroka digerin da ku, kaniyan derkin û tîna xakê vemrînin. Guv-guva cilên wê, bayê eveke zivistaniye û li hember wan,

gera zemîn û stêran radiweste.

-Xemgîn, hilm û bîn ji me hat birîn. Silava got û serî danî ser sîngê wî. Por sûlave, bi ser rû-dêm û milên wî de diherike û Xemgîn bihnek kûr dikîne, bêvlên wî tijî bihna baran.. evîn û salan dibe.

-Silava.. xwe bide ser vî kevirî.

-Çima Ê.!

-Dixwezim wêneyekê ji te re bigrim. Bê deng û mîna kevokeke sipî li kêvir dine, Xemgîn jî li per û rengan digere û hûrik-hûrik dest bi wêneya wê dike.

-Wêneya te çawa bigrim.

-Nizanim, tu min çawa dibînî.

-Dengizekê çêbikim û te bikim horî, yan wêneya te wilo mîna rûnitina te ya li

ser kevir bigrim û pêrî û melayîkan li ber lingên te deynim.

-Ez ne Vînosê didwame.

-Vînosê yekemînî, ji bilî yekê nehat jînê û ewê her bijî, heya ku, di jiyane de

evîndarek hebe.

-Ango ez Vînosê babîska bîstame. Bi henekî got û serî bi ser milan de qulabt,

Xemgîn da pey nirînên wê; Dît ku, di rûyê ezmên de baîqek difire û çavên wî li

wane, bêyî ku, ew çavên xwe ji wî bi bire got.

-Û heya bîst û.. yekan jî. Çivîkek bi ber çavên baîq ket, xwe berdide ser û di

devê wî de, çivîk berdavêje.

Xemgîn ji nû ve vegeyriya wêneya wê; Li kenara dengizê kevîrekî ree û bi pêlên dengizê re, binê wî hatiye kolan. Li ser pitê Vînosê rûnitiye, li ber lîngan pêrî û horî çûne secdê. Xemgîn çav kûrik kirin û li derpeê nerî, carekêdidiwan

pêde-ûnde diçe û bi hêrs perê xwe dikîne; Evê ku, nikare xala

Silava derîne, di cih de rûdine û dûyê cixarê ewrekî ree, ser seriyê wan digre.

Tilî dikizirin û bîna çerm tê, ji cih vediciniqê; Xizmetkarê xwaringehê dêng lê

dike ku, here bi Silava û dostên wê re xwarinê buxe.

Lîngan dixuîne û berê xwe dide ber masa wan, hîne dest bi xwarinê nekiribû,

deng bi xwediyê xwaringehê dikeve û li wî dipirse. Xwest rabe biçê, lê jê

xwastin bimîne û ger titî jê dixweze, ewê bê. Peçek naçe û ew bi jorî wan dikeve, çav bi Xemgîn dikevin, di cih de mat dimîne û tijê dengê xwe dike qêrîn.

-Rabe ji ber masê, law.. tu kere; Çawa te rê ji xwe re dît ku, tu bi zibûna re

rûne. Ê bi gotinên xwe re eqamekê dighîne wî.

Xemgîn ji cih nalve, wî ne mîna yê xwestî ku, qad veqelie û tê de winda bibe û

ne jî wek yê xwestî bibe teneyek xwê û di dengiz de bihelê, xwest. Tenê dibîne

ku, birûskek di serî de dibrûse.. lêdixe, la dilerize û xwêdaneke agirî, li ser çermê wî belav dibe.

Dema xwediyê Xwaringehê dît ku, ew ji cihê xwe nelivî, bi sukra wî digre û bi

jorde dikîne, lê hîne ew ber nedayî û mîna kêlka tirban, bi dirêjî tê xar. Di cih

de qîrîn bi Silava dikeve, kesên li xwaringhê dicivin, damarên mirovatiyê bi

yekî re lêdixin û xwe bi ser Xemgîn de xar dike.

-Netirsin.. ew dilborî ketî, dema gotinê Dibîsin, liv dikeve nav wan û du xort

Xemgîn dikin nav xwe ku, wî bighînin nexwexanê.

Çend roj di ser bûyerê re diçin, Xemgîn çavan vedike, ew li ser textekî dirêj

kiriye û Silava jî li ser keviyê rûnitî. Rondik tavên buharê Ne û ji erma re rûyê xwe vediêre, tiliyên Silava jî rondikên wî yeko û yek vedimrîne û dema

çavên wan, cara didiwan bi hev dikevin, dibîne ku, hunarîkên rûyê wê jî hatine

avadan û ji nikave sikeke re bi ser wan dikeve, çavan hildide; Rûyê xwediyê

xwaringehê, êrî wan dikin.

Xemgîn xwast bike qêrîn, lê qêrîn ji Silava kiî. Pitî nirîn û tehlîlan, bijîkan raporta xwe derxistin ku, Xemgîn wê her bimîne lal. Ew du-sê rojên dî di nexwexanê de radikeve, lê Silava xûya nabe; Bavê wê û bi tûjbûna gotinê re, rê

li ber wê û hatina ba wî biriye.

Roja çaran ji nexwexanê dertê û bi ketina hundir re, per û rengan dike dest

xwe ku, xwîna Silava bi laê Vînos de berde. Lê ji nû ve wan ji dest xwe davêje,

birînekê li kefa destê xwe vedike û bi xwîna xwe wêneya Silava jîn dike û xalekê

ji yên xwe hildike, bi bin çavê wê yê çepê dixê.

Bi dawiya xistina xalê re, tê xwar û gola xwînê, li hundirê odê fereh û fereh

dibe.

Heleb-1989

QURBANIN NÛ BO EXÎLOS

“ -Belê ev dar ji rûnitinê re xwee, pir bûyarên êrîn tîne bîra mirov, çi ji zarokan û çi jî ji keçan”. Dema ew gihît ber çem, di ber xwe de got û çiqîna xwerin, vexwerinê ji dest xwe danî ser zinarê qurbanan, pariyek nan, çend

gezên pênêr, pîvazek girs û piyala mey, li pê xwe rêxistin.

“ -Bi xweiya te be, bi qurbanin nûh û lîska wan û avê ...”. Û piyala mey
hilda
ser lêvin re û sutûr, bi vekirina dêv re, diranin kurmî tên xûyan û çaxa
mey, di
boriya gewriyê re herikî, çavên bi ûjinê qulkirî dan hev.
Temenê Êho di sih deye, lewendiya wî dilê mirov digre; Simbêl, birih û
bijangin
re-qalin, yek qijmorek li ber çavan û li ser eniyê belav bûne. Çavin re û
dîke, ti caran kesî nedîtî ku, wan dikute, yan ew di rûyan de dikene. Tê
gotin
ku, demê diçe êzinga ji tifikê re bîne, ew li nav çiyê nagere, na; Hema bi
çend
darên sindiyan, keleman digre û ji kok ve hildikîne, dixûîne û tîne mal.
Gava Êho piyala dudiyên hilda ser lêvan, di jorî wê re dît ku, tirambêlek li
kenara çem ya din rawestî û kesin jê peya bûn. Çavên wî, du reantî, girtin.
Herdu keçik bê aramî bûn; Berve çem bezîn, ba bi porê wan dileyzê,
carekê bi
banî dixê û carina jî rûdêmê ox û eng vediêre, lê ew bi zîzî ji ser çavan
didin alî. Herdu keç di bihara xwe de ne; Hinarên sîng bi bazdana wan re
di
pirpitin, mîna çar kevokan dixwezî ji qefesê birevin, bi felek û dilên tenik
bilîzin. Lê hîne lîska bê û bermalka kirasê wan naztîre, bi alandina ku, li
lingan
di ale, tijî û guloveriya qalçan dixûye û yek carên ku, bi banî dikeve,
govdeyê
sipehî û fulûs, ji seriyê tiliyan û heya derpiyê nav lingan dikute çavan û
çavên
Êho dikizirînin.

Êho nema dizanî, piyala çenda hildaye ser lêvan, nema gewrî diewite. ..
Çavan misdide, ger wilo çavên kesekî misde, ne dûre ku, gulîlkan birjîne,
nizane çi bi van mêratan hatiye, çima ronahî jê reviyê... mîna ku, di evek
buharê de, ewrekî re heyvê bigre û yek perispanin sipî, di nav de, hebin.
Li
ber çavên wî aso sayî dibe û dibhîne ku, herdu keç cilên xwe bê ermî
datînin,
lê wêneya wan, ji nûh ve winde dibe. Bi rabûna ser lîngan re vepelikî û
lêxistina
birûskê, di serî de, hêt ji bûnia xwe erm bike ku, ewî di kenara tenik de,
mîna zarokan di pîrpite, avjeniyê dike. Ken û henekên keçan bi guh de
diçe.
Cilên xwe danîn, dest di ser por re xuand û ji nûh ve li ber piyala mey
rûnit,
dest avêt û ayê duduyan. Ewrê re ,ji ber çavan wînda bûye, çav gerandin,
dît ku, herdu di nivê çem de, bi gokê dileyzin û hêdî-hêdî berve wî tên;
Mêraniya wî, mîna polêt wan dikiîne. Deng bi xweî tê, bi zimanekî biyanî
di
axifin, Êho naskir, ew kesin bajarîne, avjaniya wan ya gol û avgîraye, wê
nikaribin xwe ji devê çalê derînin û digel zanîna wî; Ger ku, çend gavin dî
bavêjin, ewê nema karibin, ji nav lepên çem derên, lê dîsan jî Êho bang li
wan
nekir.
Gok ji keçekê diçe ya dî û cara dawî, ya di hemberî Êho de, bi hêz lêda, li
zinarê
Qurbanan ket û di devê çalê werbû. Di cih de keça dî xwe avêt, Êho jêrî
xwe
nihirî, erê wê û çalê ye.

Pî-basikên wê ikestin, bi binketin û serketina ser avê re. Pir neçû û ew dighên

nîzîkî çalê, ji tirsan re ketin sukra hev û Exîlos bi ya dawiyê abû. Ji veçerpandina destan, tiliyên yekê bi mitikî, ji yên zinêr ketin û li hember tiliyên Êho rundika dibarînin. Êho çavan dikute çavên wan, wêneya girtin û

kutina xûka xwe, li bêriyê, bi destê torekî ku, xwast kêf û muhbeta xwe, vê

re bi bibîne, bi bîr tîne. Wêneyek di hundirê wêneyekê de; Dîlbera wî ji xênî

dedixin, herdu bira li rexin û bi zorê raka ber tirambêlê dikan, Êho dibeze, daxwaza wî ku, wê ji nav destan derîne. Lê xisim û rihspiyên gund, rê dibirin, li

serî dicivin û zemîn teng dibe û dibe, dilopên xwînê jî teneyeke ax nabihînin

ku, gangiliyeke sor bidin buharê. Tirambêl bi rê dikeve û qîrînek re ji Êho dikie.

Herdu keç bi rê dikevin, di devê çalê de winda dibin û li ûna xwe, çend hevde

ji çêrm û got, yên bi mit ve mabûn ... û gokeyê dileyzê dihêlin. Ê ji wê rojê û

vir de, ti carî çavên kesî bi Êho neketî.

Cindirês, 1990.

HELEBÇE Ê XORMAL

Diyarî:

“ji serokê Iraqê

Sedam kurê Husên re

Ji ajovanên balefirên ku,

bombeyên kîmawî bi ser
Helebçe û... de barandine.
Diyarî.. ji hemû segên Cîhanê re”.

Dibêjin:

Li bajarê Hîroma, gulistanek avakirine û li ber deriyê wê hatiye nivîsandin.
“Bi rehetî rakevin martîrên bajarê Hîroima, ti car din ev ewtandin dê li
Cîhanê çê nebe”.

Xormal, Helebçe... wê çi bêjinÛ!. Cîhan ê nuha çi bêje.. . Gulîstaneke nuh,
derewin nuh.. bes wîn bi miletê min dikenin. Helebçe... tifi rûyê hemû
kesên,

ev soz negirtin dike, bang li Cîhanê dike û dibêje: We li min derewkir.

Bajarê

Hîroîma jî, nameya xwe ji bajarê Helebçe û ... bi rêkir û sutûyê xwe ji
gunehên wan parast û got: “Gotinên li ber deriyê gulîstana min, ne bi
destên

zarên min, hatine nivîsandin, lewre ez barê wan gotina hilnagrim û
xwesteka

min ji we, wîn jî gunehên bajarên din hilnegrin, wek ku, gunehên we kirin
sutûyê min.”

Dîlana Perwenan

di Dojehê de.

-Mir?! . Hawar gundo.. . Miho kutin.. hawar. Dengê Xeco di xirtika
gewriyê

de tevî girîbû û herdwa hev qirkirin, nema ne girî û ne jî deng jê tê, bi
direskan

bi ser rûyê xwe ket, xwîna wê û Miho tevhevbûn, serî qot û por hinc,
sîngê xwe

çirand, lê deng jê nayê.

Cîran bi dengê qurînan re derketin û dema dengê wê kirin, bi ser mala wan de xuiyan. Lê her kesê ku, digihît ber derî, di cih de zuqûdibû, bi dîtina Miho û gevandina wî di golên xwînê de. Gustilka wan mezin bû û bû, kes dêng li kesê nake, her yek ji xwe dipirse: “Gelo, çima Miho hate kutin.. ji bo namûsêû! Na.. Miho ne ji wan kesên ku, çavaên xwe berde... na û ew ne zengîn û dewlemende ku, yek bêje: Ji bo peran hat kutin, ji bo.. . ji.” .. Miho utin.. veartin, bê girî û qîrîn ji goristanê vegehin û bê ku, xisîên Miho rêz bigrin da ku, xelk seriyên wan xwekin, sûnda giran xarîne ku, heya tola wî venedin kesî nahêlin ber deriyê xwe. Miho roja 16 yê avdarê Sala 1988 an bi destê Hemo hat kuş tin, ş eva 17 e malbeta Miho, li mala serekê malbetê civîn, rê û biryar biribûn, yek vebirajtin û li ber destê sibê, civîna wan parvebû û her kesî dev da mal. Xeco wê evê raneket, li hêviya kurê xwe ye ku, ji civîna malbetê vegere û zanibe çî biryar girtin, lê Welat venegerî mal. Dema civîn parvebû û wî naskir ku, roj din nîvro, dê amên wî mala Hemo bi ewtînin û kesên malbeta wî qirkin, bi lez dev da mala hevalê xwe Mizgîn, berpirsyarê ana wan, belkî ew çareyekê bi bînin û zar-zîçên Hemo bidin aliyekî. Raste Welat gelkî hej bavê

xwe fikir, lê bawere ku, ti sûc di kutina bavê wî de, li sutûyê kurên Hemo nakeve.

Mixabin, dema wî dabû ser rêya mala Mizgîn, amê wî yê mezin, rê li pê girt.

Wî di gotin û peyvên Welat re, dema di civînê de di axifî, naskir ku, ew ne bi

kutin û ewtandina mala Hemo re ye, lawre ew kete dû.

-Kuva diçî Welat, çima bervê te ne li male. Welat di cih de vecinqî, dengê amê

xwe naskir.

-Karekî min bi hevaleyê heye, min got berî biçim mal rêya xwe pêxînim.

-Anuha dema karê te ye, hîn xwîna bavê te sar nebûye. Amê wî bi rûyekî tal û

nirînin pîs gotê û bi destên wî girt ku, bi hev re veşerin mal, lê Welat destên

xwe kiandin û xwast rêya xwe berdewamke.

-Min bawer ne fikir ku, tu ewqasî bê xwîn û olî, lê nûha bi çavên xwe dibînim.

Tu dixwezî biçî saloxê bidî mala Hemo ku, ew birevin. Welat li ber xwe ket û

zanî rê li pê neman, bi zor... xweî divê digel amê xwe vegere mal.

Tîrêjên royê tariya evê ûtî. Gava diya Welêt seriyên wan dît, ji cih livî, toza sewkiyê jî, cilên wê yên re gewr kirine û bi xîrtiniya derî re, hundir re dibe. Çavên Hêvînê bi Welêt ketin û weke mirovekî ku, di saweke giran debe û

ji nikava cihekî parastinê Bibîne, ew nav nivîna berdide û tijî dibeze hembêza

wî. Hêvîn; Keça çar salî, ji duh nîvro de, ji dema Miho hatî kutin de, titin

nuh li mal dibîne; Ev hatina amên wê bi rûyên tir ,bêyî ku, bi wê re
bileyîzin,
giryê diya wê û ev cilên re ,lê titê tewrî biyan, windabûna bavê wê ye:
“Dayê
çima bavê min, bi ev venagerî mal, nehat û ez bi banî de navêtim, her roj
bi
ev ew vedigerî malû!” Lê diya wê tit lê venedigerand û di hembêza Welêt
de
ket xewê, pir naçe û bi giryê dê re iyardibe.
Mala Miho amedekirina kar û barê xwe dikin, dor panzde xortên wan di
hewa
Miho de kombûne, Hêvîn bi bûka xwe ya paçî dileyze, carekê cilên zer
jêdike, bi
yên sipî diguhêre û dawiya- dawî yên sor li bejina wê kirin, weke kesa
xewna
xwe dîtî. Lê çaxa dît hundir ji dûyê cixara xetimî û sînga wê teng bû, bazda
derve, çav bi mirîka re ketin, liva lingan sivikbû, lê hîne nîzîkî li wê
nekiriye ket û pirtînî bi baskên mirmkê ketin, bi bez û firîn bi dûr ket, giryê
Hêvînê da dû û dema dît ti kes, weke hercar, nehat û ew ji erdê ranekir..
tîfî
kêvir nekir, ji berxwe rabû û dev da gedûkê, pir neçû dît Nitîman; Keça
Hemo
û hevleke wan a din, bi xanîkên axî dilîzin, dev da cem wan.
Demek bi lîska xanîkan derbaskirin, pisîkekê bi dizî serî di ser sivîlekan re
dirêjkir û dema dît bala wan ji wê tineye, li ser lingên pain rûnit, lê
gewtiniya seg hêt ku, herçar di hembêza hevkevin, seg xwe tijî li wan girt
û

bezî, dil di sîngan de vemirî, hersê keçan deng li hev kirin, seg bi rewanî ji wan

derbaz dibe û bi borandina xwe re, nirînek pîs li wan kir; Ew dide dû pisîkê.

Hîn ew li hev xurcilîbûn û çav bi pepilên bi toz misdidan, rondik jê direvandin,

xuminiyek bi hêz ket guhên wan, hêt ku, hersê bi heve bibin ima, li hawîrdora xwe zîvirîn, tit nedîtin, lê deng zêde bû û reqiniyek bi cihekî ket.

Nitimanê çav bi asûman de rakirin, dît ku, balefirek mezin di jorî wan re difire, di cih de hilpekî û dest leqandin, gava Hêvînê û hevala wan, ev tit ji

Nitimanê dîtin, wan jî bi rola xwe, destên xwe di ajovan de hejandin û di zuqaqê re bezîn, çav û destên wan, nikarin xwe ji rûyê asûman bi birin, ew

dikevin, lê bê girî radibin ser xwe û bi ken û çepik didin dû balefirê, dema ji

pê çavên wan winda dibe, dil sardibe, lê piçek neçû dengêkî mîna yê yekem

ket guhên wan, bi hev re çav berdan rûyê asûmanê înan û sayî, bi wî re jî lîstin.

Lê hîn ew winda nebûbû, çend balefirin din jî ji aliyê baûr de derketin, hersê

keçan destên hev girtin û govenda xwe gerandin.

Gava kesên bajarê Helebçe dîtin, hatina balefiran li ser bajêr bêtirbûn, her kesî

bi destên zarên xwe girt û bi lez revîn ikeft û berqefan, Xeco di nav wê hêlhûiyê de, Hêvîn ji bîrkiribû, lê çaxa balefiran erê kutinê anîn ser bajêr,

li hawîrdora xwe zîvirî ku, Hêvînê birevîne hundir û dema ew nedît, li kabên
xwe xist û deng li kesên malkir ku, li wê bigerin, her yek bi cihekî de pijiqî,
nema dengê kesî diçe yê din, ji xum-xuma balefiran û qîrîna dayîkan... û
ji kalkala
dewaran serî di tengijîn. Xeco zuqaqek girtî û dibeze.
Şal ji serî imitiye, por li ber bê hêldibe, lê ji tirs û dilewatî nizanê Ku, dev
daye mala Hemo. Bi rê ve, ew û pîreka Hemo rastî hev tîn, bi yek dengî
ji hev
dipirsin: “Ma te keça min nedît”. Ê dema ku, têdighên herdwan keçên
xwe
winda kirine, ji nuh ve bezîn û her yek di dilê xwe de dibêje: “Xweda, eger
keça
xwe yan jî ya wê bibînim, ezê bibim mal”. Hêvîn û hevalên xwe, bi çepik
û
lîlandin, govenda xwe digerandin, ew di nav lîskên xwe de bûn, dema
dîtin ku,
titek vebriqî û ji balefirê hate xwar, di cih de deng li hev kirin.
-Em dîtin, wan jî em dîtin û ji me re diyariyek çekirin. Bi gotinên xwe re,
hersê
keç ber bi diyariya ajovan bezîn, wê gavê çavên kesekî navsal bi wan
dikeve,
naskir ku, ew ji mal bi dûrketine, tijî “bezî” ku, here bi destên wan bigre
û bibe
mal, lê nefesa wî ya ji berxwe teng, sîng êand û zemîn li dor serî digere,
kab jî
sist bûn û di nivê rê de ket, çend caran pirpitî mîna dîkê serî jêbe, çav
sorbûn,

kef û kopik bi dêv ket.

Dema Hêvîn û hevalên xwe dibezîn, di jorî wan re çivîk û kevokên bajêr,
bi

dengê balefiran re, ji hêlînên xwe hilbûbûn û li rûyê asûmanê tazî li cihekî
digerîn ku, xwe bi parêzin, lê fira wan her çû sistbû û nema basik karin
laên

wan hilgirin, yek û yek ji rûyê asûman têne xar. Sîngê Hêvînê teng dibe:
“Kî

çixaran li van deran vedixe”. Di nav bera xwe de dipirse û kab sistbûn,
lerizîn,

nema kare gavên xwe pêde bavêje, jan ket dil, hêsrên germ.. xwînê ji
çavan

herikîn, laê xwe duxrîne, çav bi destan dikeve, ew tijî kunêr û hebin,
hêzda

xwe ku, girî û rêya diyariyên serokê welêt bidomîne. Lê laê wê hate xwar,
hevalên Hêvînê xwestin wê ji erdê rakin, lê rewa wan ji ya Hêvînê
wêrantire,

ew jî hatin xware.

Hersê keç li nik hev ketin, xwe ber bi hev xuandin, seriyn xwe xistin sîngê
hev; Belkî cilên hevalan bê ji “dûyê cixaran” paqij bike, lê gava dîtî hîne
zêde

bû û nefesa wan teng dibe, hersê keçan xwe li ser pitê gêr kirin.

Dengê balefiran hîne tê, lê vê carê qelse, xwestin binirin ka ajovan hîn
titên

vebriqî diyri wan dikin, lê ti tit nayê xûyan; Perdeyeke re rûyê asûman
veartî. Hêvînê cara dawî hêz da xwe ku, here diyariyên serok, di hembêza
xwe

de kom bike, lê pepilên wê ji cih nelivîn.

Rûyê hersê keçan li kene, ew bawerin ku, hîne ajovan bûk û lîstikan diyarî wan

dikin û bes ji xew iyar bibin, dê herin diyariyên xwe biref bikin.

Helebçe û Xormal.. Çavên te ne di hev de ne, çima.. çawa di xew daye. Zarên te ketine xewê, bêyî ku, çavan bidin hev. Ma pembû xistine guhên te;

Çima deng ji te nayê.. devê te girtineû. Xormal.. Helebçe ketî xewê, bê deng.. ker û lal ketî. Di vê bêdengiya goristanî de, dengê: Tep.. bilind hat.

Mîna ewrekî re ser bajêr girt, lê kesî ne dît.. ne bihîst ew ketina kevokeke sipî ku, ji rûyê ezmên hate xwar û cih di navbera keçikan de girt.

Kesî ew ne dît.. ne bihîst, ji bilî min, ji ber ku, ez ajovanê balefirekê ji wan balefirên ku, bombeyên kîmawî bi ser wan de barandine bûm, he...

heheheheeeeeee. Dengê Kenê wî her titî din winda dike. Naaaaaaaaaaaaaa.

Heleb-89

XEWN

Qurîna seybê li qirikê ket. Lae û serî ji hev birîn; Bi lêketina qurînê re vepelikî û serî bi çend gavan ji ser milan pekî.. reqinî bi qoqê wî ket û jiyan li

ber çavan re bû.. bijang kutan û çav ji nuh ve rakirin.. bejna xwe bi xakê re

dûz dît. Ji rewa xwe ya nuh mat ma: “Gelo, ka ew bejin û bala min a dirêj, ka

mil û pepil, ling û.”..

Hîne ramanên xwe bi serî nekirine, çav di serî de beloq bûn; Dema ku, laekî bê

serî dît. Temenê wî gihîti sî salî, lê ti carî mirovên bê serî nedîtine. Bi

naskirina wî laî re, beloqbûna çavan zêdetir bû: “Gelo, ev.. . Erê, ev.. ev laê min e”. Gava wilo dît, di cih de dilê wî borî, lê serî bi ser milan de ne qulibî û xunava buharê hêt ku, hiyar bibe.

Cara yekeme mêjî xwe bê ê dibîne, serî di hundirê xwe de gerand; Ev bû sîh

sale hertim bi êim, çima pitî la hate birîn, ê ji min revîn. Lê ew zû gihît çareya vê yekê: “Çima dê ê di mêjiyê min de hebin. Dema ez û la yekbûn, êên min tev ji wî bûn; Xwestekên dil, ên nav-zik, ên.. ên. Lê anuha

bi ya xwe me, kes ti titî ji min naxwaze.”

Ew bi ramanên xwe re mijûl dibe, lê carina çavên xwe davêje ser ewê ku, jê re

digotin: Candekê te ye. Xwîn ji sukra wî diherikî û anuha, dema çav pê ket, dît

destên wî bi jor ve kîin; Ew dixweze serî bimelisîne, lê weke hercar bi ti titî

neketin. Çend carên din dest lebitîn, lê ba kete nav wan. Weke vizvizokê li

dora xwe geriya û ket. Devê serî ji hebû û kenekî bê deng jê hat, digel bêjeyin

ker û lal; “Hêy.. . Tu li çi digerî, ez li vê derê me.. bes, tu yê ji kuve zanibî; Ne

çavên te hene û ne jî mêjî ku, tu pê bi ramî û cihê min nas bikî.”

Laê bê serî ji nuh ve rabû ser xwe, kabokên xwe ji tozê dawandin û çend gav

avêtin, lê ew ji bin zikê kevirekî vepekî. Kenê serî yê bê deng bilind bû, anuha

naskir ku, çi qedir û qîmeta wî hebû; Ev laê pan û dirêj bûye ker, bêyî wî.

Lae jî, cara dudiyan, dîsa xwe dawand û ji wî kevirî vedipeke û li bin ê dî dikeve, carina ji serî ve nêzîk dibe, lê ji bê hîiya xwe ji nuh ve bi dûr dikeve. Dawiya-dawî serî dît ku, ewî nêzîk dibe û dibe.. . Mêjî tengijî, nema kare sukra

wî ya bi xwîn bibîne, piçeke din milên wî jî wenda bûn.. di pit re nava wî, li

dawiyê Ew bû dêwek; Çav nema dikarin ji bilî tiliyên lingan ti titî din daqurtînin.. . Di cih de hejiya û li ser xakê loq bû. Lêe xwe xwarkir û dest li

hawîrdora wî gerandin, guh ketin nav tilyan, det û çiya, çivîk û asûman ketin

çavan, lê piçik neçû dît guvgiva bê tê û reqînî pê ket; Mejî bi teqandina qoq re

belav bû.. . Guh man dudiyan berê, lê dev jî bûn dudu û çavekî bi ken li lêe

ye, lê çavê din li aso ye û bi girî. ..

Di cih de veciniqîm, min dît ku, ji ser textê xwe ketime ser çemento û canê min

ji serma di derize û dema hi hate seriyê min, dest ji xwe û berê, serî melisand.

EFRÎN- 6.2.1990.

XWÊYA ZENGARÎ

“Gotin ku, bîrkirin serekê heft dermanaye, lê pitî van bûyeran dibînim, li min

derw kirin”. Sifra xwe diyarkir, hilgirt anî derve û dema xwast buxe, dît nan ji

bîrkiriye, bi xeber û sixêfan bi xwe û va bîrkirina xwe ket, rabû ser xwe û dev da

hundir, lê reîbû û bi rêve eniya wî li kevirê koê ket, axîn pê ket û ikest,
xwîn jê xilxilî, morîka elektirîkê guvat, lê akir, ne ewbû ya dîbû, hundir
ronak bû û li dermên gerî, hinek jê ket û pitî demekê dermanê kewandinê
dît,
birîn pê kewand û ber bi selekê ve çû û nan jê derxist.
Vegerî sifra xwe, li ber rûnit, lê ji cihê xwe gewz-xweî nedît, cih gewirî,
çay
berda piyalê û dest avêt nê, dît hike, sixêf û xeber gotin: “Ev çi rewe, ne
tu
bî û ne va jiyana te bî. Dema yek bixweze nê buxe, dive pêncî kar û
xebatan
bike û digel birîn û tolazîyê”. Ev gotin û peyv di ser dîwêr re firîn, cîranê
wî;
Çavadarê polîsan guhdar dikir, serê xwe hejand û lêva xwe gezkir: “Him...
xûyaye cîranê min ji rewa xwe ne raziye, lewra xeberan ji rejîma welêt re
dide,
dibîne ew sedema vê yekêye, bi Xwedê ev titekî mirov nikare li ser
raweste,
divê saloxê bidim mezinê polîs”. Aram ne hat wî, bi ev çû salox da wan.
Xwarin dixwer, lê ramanên wî ne bi xwarinê re bûn, mêjîyê wî di gotinekê
de
westiyabû, ew jî bîrkirin: “Gelo, dema mirov ji karekî mezin titekî biçûk ji
bîr
bike, wek tu ji dezgehekê perçakî biçûk ji bîr bikî, dezgh nagere.”
Di bin hêza ramanên xwe de, ji bîrkir û dest li piyalê Ket; Ça bi ser de rijî
û
dema ling ewitî, hufînî pêket û zeiter hilfirî gewriyê, bû uh-uha wî û bezî
ku,

here avê vexe, lê erbik valbû, ber bi henefiyê çû, ew jî hikbû, av jê nehat. Deriyê derve vekir û xwest bi lez kolanê bi bire, ji bo avê ji cem cîranan bîne, lê

mêrata wê tirombêlê nehit bighîne xwaza xwe, lê qelibî û ket bin. Rebenê ajovan di cihê xwe de zerbû, bi qîrîna wî re, cîran civîn û dema dîtî cîranê wan

di xwînê de geviziye, ew wilo hîtin û tev bezîn ajovan, bi qirika wî girtin, ji

tirombêlê xuandin û bi kulm-panan bi ser ketin, hew jî gihandin bûnia cîrên. Demek dirêj çû, yekî ji wan pirsî:

-We salox da nexwexanê. Tevan li çavên hev niherî û bi yek dengî gotin: "Na". Xwediyê pirsê, bezî ber telîfona mal ku, saloxê bide nexwexanê, lê bersiva wan jêre: "Ew nikarin werin, ji ber ku, tekerên tirombêlekê fibûne û ya

dî benzîn têde nîne, tirombêlek ne li wire, nizanin kuva çûye, ya din jî ajovanê

wê ne li wire". Wî telîfon danî û bezî cihê bûyerê û bi dengê bilind got:

-Dive em cîranê xwe bi xwe bibin, ji ber ku, tirombêlên nexwexanê tev li riya nexweane. Her ku, ew gotinekê dibêje, carekê li çavên çavadrê polîs dinir, dît wî guhên xwe pîçkirine û daye ser gotinên wî. Bi gotinên wî re, tev li

hev xurcilîn, nedizanîn dê çi bikin û nekin, kesina got: Em cîranê xwe tenê rakin, çi îê me ji ajovan heye. Lê çavdarê polîs poz bilindkir û got:

-Cîran no!. Ev bûyere û em nikarin titekî bikin bêyî fermana hukümetê, ez

dibînim em soloxê bidin polîs, ji bo seriyê me ne êe.

Tevan li çavên hevdu nihêrîn, seriyên xwe hejandin û gotin: Raste. Salox dane

polîs û ew bi lez hatin, bi gihîtina wir re wan des bi lêdan û pirsên xwe kirin.

Bûyer ji wan re sayî bû, ji despêkê heya dawî, lê bersiva nexwexanê ku, çî

gotibû wan, ji polîsan re ne gotin. Ew di nav peyêvên xwe dabûn, dema bibû xîzxîza

cîranê wan di bin tiromêlê de. Hinekan xwe xûzkir ku, binirin çî pê hat, dîtî bi hêz seriyê xwe hilda; Teq.. li binê tirombêlê xist û argûka wî ji hev qeliî.

Fixtînî pê ket.. û ket erdê, bû lem-lema wan, hina got: Mir. Hinekên din jî got:

Ew di êe. Li seriyê hev kombûn, xurcilîn. Polîsekî xizêrana xwe bi dest xwe kir û bi laan ket, ji ser hev belav kirin û bi qirika yekî girt, ew ber bi tirambêlê

kiad da ku, wî kesî ji bin derîne û dema ew bi destên wî digre û ji binê tirambêlê dixuîne dibîne ku, candekê wî sare, tamarên xwînê lînadin.

Polîsan bi qirika ajovan û cîranên kesê mirî girtin, tev xistin cîbê. Siwarbûn û

dev dane mexferê, pitî dan û sitandinê û nasîna wan ji kesê mirî re ku, ewe yê

sixêf û xeber gotine, deftera xwe vekirin û fermanên xwe nivîsandin.

*Ji ber ku ajovan bi evê bûyerê kesekî siyasetmedar kutî ku, me karîbû di

riya wî re gelek dijmin û sîxorên wan bigirtana û meyê naskira ka armancên

wan çine û wan çî nîan li pê xwe danîne û me karîbû, wê demê, rê li ber wan

bigirta û welat û milletê xwe ji wan biparêza. Lê anuha û pitî ku, ew kes bi

destê vî ajovanî hate kutin û nema em dikarin evan agehan bi dest xînin, lewre em ji dergevanê girtîgeha welêt dixwezin ku, hûn wî bavêjin binê zîndanê.

*Û ji ber ku, cîranên kesê mirî li ajovan dane û lêdana wan, ew birîndar kirî,

dive em cîranan tevî zarok û pîrekên wan têxînin girtîgehê, ji bre ku, em nizanin malxûyên malê bi tena xwe li ajovan dane yan tevî malbeta xwe û em

nikarin evî titî biçespînin heya ku, ajovan ji dilboriya xwe iyar nebe. Lê ji mirovantiya xwe em û ji her malekê yekî berdidin ta ku, here cem mirov û

xismên xwe û saloxê bide wan, ji bo ew serokê malbeta xwe bînin.. û dive ew

xema xarin û vexarina mirovên xwe yên girtî bikin.

Ev ferman ji her kesê ku, ji wan tête xwestin bi cih bînin, dive hemû ênên xwe

bikin ku, wan bi derengî nexin û.. . pat.

Heleb, 89

Nameya Qoqê

Hemê Re.

-Tu çî dixwezî. Carekê-dudiwan Xelîlê Simo serî çelqand, bihin bi hêz ki-and û

berda, digel xir-xîza gewriyê. Lê çiqwasî ku, dixweze zîperek di wî de bilive,

ewqasî tête qerimandin; Giraniya zemîn li ser dil mîna toliya ser baskên mêa

hunguve. Û seriykî bê la ku, yek hêsrin re dibarîne, ber bi wî tê.

Laê X. Simo di golên xwêdanê de tête utin, serî nêzîk dibe; Çavek hatî

perçiqandin û kurmin re jê diwein û dema dêv ji hev dike, qirikin tarî difirin.

-Rabe ser xwe û canê min ji qefesê berde. Bi ketina qirikekê di ber wî de, ji xew iyar dibe. Çend ayetên Quranê dixwîne, tîfî sîng û derdora xwe dike, lê heya ber destê sibê xew neket çavan.

-Min çî gote te. Vê carê kurmên re ji hemû qulikên serî dikiin û ber bi wî tî.

-Ez rabim ... min tu nebirî... girtî, tu çî dixwezî... ez namirim. Matmyîya Xelîl ne tenê ji van ton peyvaye, a bêtir ewe ku, bêyî devê wî ji hev bibe, gotin di pozê wî re diwein.

-Bes tu di xew de mayî, rabe were gunê Donxiz, ser gora Hemê Re û canê min

ji zîndanê berde. Bi ketina serî di hembêza Xelîlê Simo de, kurmên re ber candekê wî dikin û bi çerpîna destan re da ku, wî serî ji hembêza xwe bavêje, ji

xew iyar dibe. Dîsa çend ayetan dixwîne, lê xew bi wî bûye jehra marê re. Di van çend rojên dawî de hertim ev xewna Xelîlê Simo ye, li pir mele û êxan

gerî, lê ti çare nedît. Çav bûne kizotên êgir, her ku, wan dide hev serî digel kurmên xwe yên re ber bi wî tî. Xelîl ti ziyaret, nivitên meleyan nehêtin ku, hêviya xwe nekir wan, heya hertim pirtûka Quranê di destan de ye, lê bê

çarebûn. Nemaze û di van rojên dawîtir de, nema seriyê bi kurm bi xewnan tenê

dike, çav du dojehin, mejî pelûle... û serî digel kurmên xwe li wî dibe mêvan.

Dema xismên Xelîl dîtin ku, ew bi xweî di dojehê de dijî, çendekan gotina xwe

kirin yek û bi ya xewna wî kirin; Dev dane ser riya gundê Donxiz, ka gora Hemê

Re çî dixweze.

Girekî kevnare; Di sed-salên berê de ava bûye, op û hilma Kîkiyan jê diherike

û ji bin bask û siya wî, gondekî nûjen dike. Kesên gund, ew gir û hersê gorên

li ser, ji xwe re kirine ziyaret.

Gora Hemê Re ya nîviye, bi paçik û benikên reng-rengî yên kevin û nuh hatine

veartin, bûne zaroyên di pêçekê de. Dirêjiya wan goran ne li gor kesên îro ye,

ji çel gazî û hîne bêtire. Bi deng û hêlbertiya xismên Xelîl re çend dûpik û mikan, xwe di çalên gir de veartin.

Bi vedana gora Hemê Re re, seriyê bi kêz û kurm ji çavên Xelîlê Simo dikeve û

hestiyin dirêj, qalin dertên. Li dawiya-dawî qoqê wî dîtin ku, bi çend pêyan xwe

dûrî term kirî, bi tirs û êt dest avêtin wan çend pelên ku, di yek cihan de kizirîne, bi kiandina wan pelan re ji hundir qoq, bû zîrk-karka diranên Xelîl û

çen kurm re ji laê wî weîn û xismên Xelîl destnivîsa qoq li ber xwe verandin.

-Tu bi xêr hatî Xelîlê Simo. Raste te hatina xwe bi derengî xist lê ne xeme
û
ger ku, tu dipirsî: Çima min tu ji nav xelkên vî warî xastî, wê pirsê ji canê
xwe
bike û wê demê tu yê zanibî ku, ew ji berî bikeve termê te û dised salên
berî
zayîn de, ew yê min bû. Lê xastina min ji tera ne ji bo vê yekêye; Pirseke
min ji
te heye, lê ji berî pirsê xwe dikim, ka gudarî çêroka min bike û di pit re tu
yê
zanibî pirs çiyê.
Rojekê ji rojan û di nîvê eveke har û dijwar de, deriyê min hate kutan û
dema
ku, min ew vekir, çend kevokî sipî digel perspanin berfê ketin hindir û li
dû
wan kalemêrek ku, bi rengê sipî hatî ûtin, dikeve hundir.
Agirê Pixwerê, dilopên baranê ji ezmanê rûdêmê kalemêr dibarîne û ji
min
nepirse kanî xwerina li pê wî, ne ji gerdiên milletê me ye ku, li ser camêriya
xwe bipêvin. Ê pitî ku, na-xoyê di navbera me de çêbû, kalemêr gote min:
Ezê
niha çêrokeke dîrokî ku, ewê di pêerojan de bibe, ji tera bêjim. De ka em
bi
hev re li çêroka wî guhdar bikin.
Di sed-saliyên di dû zayîn de, dê çêrokek di nav Kurdan de bi navê Siymen
û
Xecê Peyda bibe, evîna wan ê bibe al û nîana evîndara û di rojeke buharê
de

herdu bi hev re dertên nêçîr û seyranê – agirê pixarê ge dibe -. Hespine
rewan

di bin wan de ne; Bê û aso diçirînin, çîk ji bin simên wan difirin û di wê
lez-bezê

de, çavên Xecê bi êre-xortekî dikevin, qîjînî bi dil dikeve û hevsarê hespê
xwe

dikîne.

Xezalek jî ket pê Siyamend, bala wî ne li Xecêye ku, ew û xorte-êr di bin
diriyên kelemê de ketine xewnî êrîn. Siyamend xezala kutî digore, çend
par ji got di ser kizotên êgir de diqij-qijin û bêhan wan, opa wî ji xecê û
xorte-êr re, xûya dike. Ew li jorî benê rûnitî, pita xwe dayî bayê felekê, bi
kutana darê rumê di pita Siyamed de ji aliyê xorte-êr, kevir ji bin lingan
di

herifin û di kûraiya benê de diçe xwar, mitekî kevin.. dar-hestî sîng û dil
diçirîne û serî di pitê re, di nav herdû milan re, hildide.

Kalemêr serî ber bi min hildide, dilopin xwînî ji çavan dibarîn, rengê
kevokan

sor dibe, pirt-pirta wan li ber deriye û bi derketina kalemêr re, ew ji xênî
difirin.

-Xelîlê Simo. Bi dengê Hemê Re re çend kurmên re ji laê Xelîl dikevin.

Pitî ku, te guhdariya çêroka kalemêr kir, ka bêje min: Çêroka wî bi cih hat
lê

na û bêje min çêrokên îro çine. Kenekî zer li ser rûdêmê Xelîlê belav dibe.

Bi ronahiya ku, bi ser gir dikeve, xismên Xelîlê Simo ber bi wî dinhêrin;

Ronahiyeke germ.. tûj ji wî dikie, serî bi ser mil de dikeve û tava kurmên
re

ji wî dibare, ji wan golek bi hev dikeve û lehiyek diherike. Termê Xelîlê
Simo bi

ser lehiya kurm û kêzan ketî, ber bi gora Hemê Re dimee û di ûna wî de cih digirin.

Û îro Xelîlê Simo li kesê ku, bi caên wî dijî digere da ku, çêroka xwe jê bipirse.

Heleb, 91

XUNAV

Pirs, pirs .. . Tu ji ku yî, navê te çî ye.. yê bavê te, diya te... gundê we li kuderê ye, tu çî karî dikî, navê.. . Mirovê îro di gol û derya evan pirsan de diçe

xwar û hertim di hundirê wan xelekên pirs û avgerînokan de dizîvire. Serî hilda, bisk mîna sûlav, tîrêjên rokê bi ser eniya kale-gewr de herikî.

-Tu ji min hezdikî, pirs.

-Çi bêjim: Erê yan na, ka em ji pelên çîçeka mêst bi pirsin. Dîsa pirs; Hezdikim, nakim, dikim .. . dikim, nakim. Pelê dawî got.

-Te dît; Tu ji min hez nakî, çîçeka mêst, ne çê û ne jî xerapî zane.

-Belê.. ne çê û ne xerapî. Ji ber wê yekê, ew derewan dike. “Çima ez derewan

nakim; Ne ji ber çê û xerapî dizanim, divê bikim.” Lê ka pelên dil bi qurçimîn,

ewê çî bêjin. Bijangên min, yeko-yek, biçin û jê bi pirse: Hej te dikim, an na.

Keserên min bijmêr, diranên minî kurmî û hevdeyên por, yên sipî.

-Min li ser te bihîstî ku, te gotiye: Ez mîna perwana me û bi guleke tenê nakim,

ji yekê difirim ya dî. Hevalên te dibêjin: Duh Silav bû, îro Perwîn û siba Xunav.

-Gotina wan e; Perwanbûm, ji gulekê di firîm a dî û carina bê ku, binîtama di

ba hin gulan re difirîm. Lê di evek tarî de, kuzotên sor, dojecha te çavên min

girtin, bi rêberiya te firîm û di tîna dil de kizirîm.

-Bawer nakim, ez ji evîna te bawer nakim. Perwîn ê dît lêvên wî lerizîn û têgihêt ku, gotinên wê ne di cihê xwe de hatine.

-Peyv, or.. . Ger gihitibama ewê yekim ku, gotin afirandiye, minê di qirikê de bi xeniqanda. Ev gotin, tîp û pevekên bê sûd, kê jê re got: Ewê karibin tîna

dil, nirînên evîndara, hejandina serî û gezkirina lêvan wergerînin; Çi wergerandin, qey ew hest têtin wergerandin û ji te ye jî ew peyvin û kengî tîp û

oran, can bi evîn û hestan de berdaye. Perwîn ê nedizanî ew bi xwe re dipeyive yan bersiva wê dide, lê tevî ewê tenegehîna xwe jî lêvegerand û

got.

-Lê ev titên te gotine, tev orin.

-Lewre xwîna dilê te ne herikî, damarên te ne çirîn, por û bijangên te ne qijilîn,

pelê dara ne weîn, ava çem û kaniyan ne kelî; Ji ber ku, yên min gotine orbûn û ne tîna ku, dil dikole û dikole û kulekeke fereh û fereh lêvekirî, hêtî

ku, dar û çem, jîn û felek û heya nirînên te jî, têde winda bibin.

-Lê ne ji gotinan ba, me yê çawa derdên hev naskira. Perwîn bi tirs pirsî.

-Gotin.. gotin. Çima ji min re nabêjin kîjan bavsegî peyv afirandin. Pirs, dîsa

gotin.. tufî; Binihêre li gul û kevokan, hov û keran, di piçekê de dighên hev, bi

nirîn û gezan dikarin ên dil derînin.

Destên xwe ji nav porê Perwînê kiandin, ji nik wê rabû û ber bi kaniyê çû;
Avin zelal, zebean diteqîne, xwe li ser çîm dirêjkir, tîna rokê çavên wî li
ser

wêneya Perwînê dane hev. Wê jî û bi rûnitina xwe re, bi zîzî, serî danî ser
kabokên xwe.

Pitî demekê Şemgîn çav vekirin, dît hinarîkên rûyê Perwînê, bi xunava
buharê

hatine avdan û ji nû ve mijang dane hev.

“ -Çi dibêjim; Çi ji devê minî zingarî dertê, heya bi çend kîlomitran, ev
bihna

genî, pelên dara zer dike, diweîne. Ew ji bihna laa genîtire, na û sed car
na;

Ev ne sûcê mine, dê û bav, dost û heval, hûn tev.. belê, belê; Ew tevan,
ev

lae, pîsîtî û gotin di min de çandin. Lê na, xwe bi dest we de bernadim,
nabim

sola lingên we. Divê hûn bihayê vî gunehî bidin; Kêr, tevo û tiving dê
çibikin.

Çavekî bi perçiqînîm, zikekî bi du cana hilweînîm. Çareyek divê, alavek,
êweyek ku felekê paqij bike; Agir diewtine, ji kevin de, ji rojên Zardet û
Pîran de, agir êweya kewandinêye. Lê na.. dilê min pê diewite; Di gola
jînê

de, gola req û beqan, kêz û kurman, dûpik û maran de, agir wê çî bike”.

Bi

mirqiniya ramûsan ku, Perwîn ê ji nav biriyar biribû re, Şemgîn çav vekirin
û

rûdêmê wê sorgolî dibe.

-Te xew nekiribû. Bi fedî pirsî û Şemgîn destên wê kirin nav ên xwe û

guvatin, ta ku, feya dîrokî jê birjîne. Tu gihîte kuderêÛ. Ew jê dipirse.

-Ji ba te nelivîme. Şemgîn bi gotinê re rabû ser xwe. Guhên xwe bide min; Dipirsim.. tufî, vê carê ez dipirsim. Eger ku, jiyan ji ber van gotinan neyê teqandin, dê ji ber çi bête ewtandinÛ. Yek xêz di rûpelê rûdêmê Perwînê de,

bi gotinên wî re, hatin kiandin û taveke biharê ji ezmanê çavan hate xwer. Lê

pir neçû wê destek danî ser eniya Şemgîn û ber kenî bû.

-Hîne dîn nebûme, belê.. . Piçekê rawestî, du cixare pêxistin û kesera wî perdeyeke zer xiste ber çavan. Demê ku, ez û dilbera xwe.. çi dilber; Ma ne ev

jî gotine, nizamim çi bêjim, ji ber ku, ti gotin wê tine bin ku, wêne, qedir û qîmet, ox û egiya te bidin naskirin. Dêm, ebrû û mijang.. çav.. dev..

poz... por, rengê por.. hilim û bîn.. dest û ling. Demê em van titan, bi gotinan, girê didin, ew têne kutin. Çaxê nikaribim, bi gotinan, evên dirêj û

êên dil, xemgîniya çavan û lerizandina tiliyan vejînim, dive hûn û gotinên we

bêtin perçiqandin. Perwîn ê xwest lêmit û kela dil rawestîne, lê mikên xerap, sedê Meirib ê qulkiribûn.

-Ax.. ax, ger di dest min de çend û çend bombeyên kîmawî, nitronî hebana

min ê ev jîn ,felek û gola pîs û qirêj biewitanda; Belkî jiyanê nûh peyda biba, jiyanê bê mirov, mirovin bê peyv. Lê ger ku, li cem bav-kalên min ti

tit peyda nebû, dê titekî hêja li ba we jî tine be ku, yek bi ser de bigrî Rabûna bê, hejandina zemînê û xur-xura keviran hêt ku, Perwîn bi milên Şemgîn ve bibe ima. Ev nîan, ne ya xêrê ye. Wê got û devê kaniyê ji hev

dibe; Dêwekî kevnar , ew kirin bin tepe xwe û bi milên Perwîn ê girt.

-Ev bûye çend sal ku, li benda qurbana me. Kanî bihayê xêr û bêra didime we

û çima ti kes ji we nedipirsîn: Kanî xwediyê evê ava kaniyê, ew li kuderê ye û çi

ji wî re gereke.. . Ew jiyana xwe çawa derbas dike û.. . Şemgîn nahêle ew lehiya xwe birjîne û bi hemû hêza xwe êri ser dike, lê bi lêdana ewê panê re,

ew ji xew iyar dibe.

Dengê daholê anî bîrê, dê çendekî din, Perwîn ê derrînin û.. ew derxistin, lê du

lae; Yek birin ser tirbeyên gund û bê utin û selace, ji ber mele di fetwa xwe

de got:

-Kesê ku, xwe bikuje û di pêgirtên me mislimanan de, çênabe ew bête ûtin

û ne jî ji nimêj li ser dibe. Her tim ewê di agirê Dojehê de bê kutin.

Laê din jî birin mala zêve.

HELEB, 90

YARA

Xaniyên axî, malên bê keskayî û dar. Babilîsoka kor jî û di zuqaqên teng de,

Cengoyê Hemo û rêberê wî dorpêç dike û bêvilên wan bi bihna tozê mit dike,

nav rîh û porên wan jî, bi tozê û yek perçîmên pikulan, têtin dagirtin. Pitî babilîsok ji wan derbas dibe, bi temîzkirina xwe de dikevin, Cengo bi kuzûrî

dirame; “Çima bi vir ketim Ê. Mala Yara ji ku ve gihitî evê gundê, ji rûpelên

dîrokê, ji bîrkirî, heya berî çend rojan em cîranbûn, çawa bi vir ketin.”!? ..

-Em gihêtin. Dengê Henîf ramanên wî didize. Kutana derî û gotina fermo û

ketina hewê dibin yek; Têvedana derî, ew xistin gulistana hevzoyên gul û rihanan, baxçeyên meywe.

-kîne ew.. keremkin. Dengê Kepaniya malê, ji hundir ve tê û gava çav li Cengo

dikevin, berkeniya wê erpeze dimîne; Nema dizane rêya belavkirina ser rûdêm li ku maye û regezên can û hest, ji dûzana xwe dikevin. Rondik barîn,

dûman û ewrekî baranê, ji wan bi hev ket û bi ser seryê Cengo de, teneyên

toliya barîn.

Weîna toz û telazê jî ji ewrekî zer ku, bi Memo re hat; Perdeyeke re dixîne nav wan de û tev dikevin hundir. Cengo barê silavan, ji ser milên xwe danî nîvê

hundir da ku, silavên yeko-yek derîne û belav bike. Demekê bi ûn de, Memo

bi mêvanê xwe re, yê ku, ji berî Cego û Henîf bîn, hîne rûnitibû dertên û diçin, lê ew sozê dide ku, dê zû vegere mal.

Dem dibe benît û ji evê naqetê. Henîf keys neda wan ku, ew yek mistan ji

kaniya evînê vexin; Dêwê di devê kaniyê de rûniti ye, lê çaxa bi (Tawilê(dilîzin, xwe ji bîr dikin û Cengo carekê dît ku, kat li “3.30” ye, ber destê sibêye. Ê Memo hîna venegeriye mal.

-Henîf... tu dizanî kat çend in. Ev gotin fermana çûyîna wî dide.

Cengo ji xaniyê ku, ew û Henîf lê dilîstin tê yê ku, Yara û zaroyên xwe lê raketîne, xwe li ser nivînan dirêj dike. kalê Malê; Bavê Memo çavan vedike...

titekî nabêje, cilek paçî dikeve destan de û bi ser serê xwe de dike. “Yara çireyeke vemirtiye”, ev gotin di guhê Wî re diherike. Roniyeke sivik ji cihekî

tê; Wêneya Yara di çavan de diçîne, xwe dixwe nav nivînan û tiliyên Cengo xwe

tajon nav agirê pîran ku, çîk û gurzên agir belav bikin.

-Kalê xew nekirî. Yara du caran jê re got, lê nema ne kal û ne jî ew xortê teze,

yê ku, heya wê çaxê tinebû û mîna cinan, di ber pozên wan re der dikeve, ne jî

bayê sur-sur, dikare wan ji hebêza hev derîne û çaxa xwst ku, yek mistên avê ji

kaniya ku, di kabokên Yara de derdibûn vexwe, kal dîsa serî hildide, lê perdeyek

li ber çava ye.

-Ji bo min, ger tu hej min dikî, divêt tu bixwînî; Cara pain ku, hatim ba we,

tevan ji min xwest ku, xwendinê di serê te de biçînim. Gotin di devê Yara de

tên guvatin, bi kela hinavên wê.

-Nema ez xwendinê bi serî dikim. Cengo bi gotina xwe re, ramosanek ji nav

birihan bir; Segê ku, hertim hestî distandin, ji nika ve qopeke got li pê xwe dibîne, êrîê dibe ser. Kiandina kale-mêr ji orxanê re dihêle ku, Yara bi

temamî bibhîne; Kiras xewê kiiye ser navikê, derpiyekî aravî ji çar tiliyan
di
nav linga de ye, lê bala kale-mêr ne li wane û ne jî ya wan ji wî heye. Seg
qopê
got xiste devê xwe, diran têde cûmkirin. Lê bi bihin û daxwazên kaniyan
û bi
dîtina kenarên delavên kûr, bi kûrbûna bîranînan, ku bi zorê di bin
ezmanekî
aravî de, hatine vearartin, seg har bû û.. derziya bencê wî gêj û sersend
dêxîne.
Bi vekirina çavan re, Cergo dibîne ku, ew û wî xortî di kavilekî da ne: “Te
ez bi
dûr xistim”. Bernav, beriyên xwe tevdide; Kêr-dûskik ji paelê bi der tê. “Ji
berî çend salan û li Efrîn ê, mirovekî min yekî Ereb bi kêr-dûske wilo kut.”
Çend caran di dest xwe de dilîskîne da ku, pê bide nasîn hostekare û
herdu seg
rabûn hev, dêl temaa wan dike, diran tamaran di çrînin, xwîn di xul-xule
û
yek diweste û bi kêmanî ji dêlê bi dûr dikeve.
Ji hundirê kivil bi dertê û berê xwe dide mala Yara, da ku, tîna dil, agirê
jîne li
ber kaniyê vemirîne, lê bi rê ve ji xwe dipirse: “Eger Memo bi mest
derketibe, da
ku, me bi hev re bibîne.” ...
Gundê Yara di vê çûn û vegerînê de hatiye guhartin; Mezin bûye, mîna
ku,
Cindirês di navbêna du xewnan de mezinbû. Çavên Cengo bi titekî
nakevin,

ne mala Yara, ne kale-mêr û ne jî zaro. Nependiya Yara hêt ewrin eydayî
li

serî bên pêçan û gêj bi keve.

-Qamilo... belê bajarê min e, ev rêya du piraye, ev sînema Remsîs e; Di
navbera sînemê û sînemê de, sînemeyek heye.. . Kanî rêya mal". Cengo
çawa

dilive, kuve diçe, bala xelkê lêye, lê ew titekî biyan di xwe de nabîne. Her
yek

tena dînitîyê, di kirasê civakî de, vedire. Ew jî tevî wan çend kesên li
hêviya

pasê dibe, yekî nav-sal berve Cengo tê û dipirse.

-Tu çi karî dikî Û.

-Ne karê te ye. Bi hêrs vedigerîne, nema pozê xwe ji kesekî re datîne û bi
bersiva wî re dînekî din, dêng li civatê dike:

-Belkî dîne. Çi karî dikî.. law. Û mîna yek bixwaze zarokê bitirsîne, zimên
dertîne û dilopin girîz bi ser çenê de diherikin. Çavên xwe beloq dike,
destan

dide ber guhên xwe û di hejîne. Cengo xwest wî bifetisîne, lê
cendirmeyan ew ji

nav lepên wî derxist.

Girîz, kef û kopik, porhincî û kenê bûdele, baweriya Cengo bi cih anî ku,
ev

kesekî dîne. Xistina wî kesî hundirê tirambêleke lekerî, ji aliyê polîsan ve
û

çav pêketina wî dihêle ew biqîre: "Çima.. ez di ûna bûdele de nebirimÛ.

Ey

lekerên.. seg-bav, min erê xwe tê da, çima we ez berdamiÛ.

Kab sistin, sabûna wan derxistine û her carê ku, dixwaze rabe ser xwe,
ling bi

pê û ûn de dielin; Her ku, ew dilive, bêtir di qûmê de, di dem û zemînê de
diçe xwar. Jiyana girîzokî bûye û gêreya di cihê pelûsan wer bûye, çendî
dilive

nikare xwe ji girîzê derîne, cara sedî, gêre barê xwe gihande serê zinêr û..
Nabilyon çû êr.

Ew dibeze ser pireya ku, bajêr û zindanê bi heve girê dide, çavên wî bi
Yara

dikevin, dev kilît dibe û ziman direwise, çav jî pir êan dadirivînin. Lê
tirambêla lekerî bi rêdikeve û bi qulaptina wê re, qîrîn bi Cengo dikeve;
“Kiandina evrmêye ji kelemê ye”. Dît Yara digel Silava biçûk di kenara pirê
de çûn xwar û di nav ber wî û wan de, perdeyeke ji bê û avê, ji xewnan
tête
danîn.

Cengo xwe bi ser hesinê pirê de xwar dike, di bin de kaniyên zelal, axa
sor,

baxçeyên meywe û hinaran, çemên ji mey û hingiv diherikin. Leylana
dengekî,

ji kûraniya xewnan dikeve guhên wî; “Navê te jî gihit me.. dema êkenceya
te ya di Dojehê de kuta bû û divêt tu vegeerî Buhitê.. îro roja hevdîtina,
Adem

û Hewa ye. Xweda ji peymanî xwe vegeerî ya û rê da candarên xwe ku, di
Buhitê de hevdu bi bînin.. Yara li benda teye.”

Cengo piçekî rawestiya, hest û mêranya xwe da hev û. ..

HELEB, 91

NALÎNA GIRTÎGEHAN

Hing li det û çiyayên welêt firî û gerî, nedît ne dar û ne jî ber, ne gul û ne

sosin; Ew birçî vedigerê mal û bi rê ve ewê “kelehê” di pêiya xwe de dibîne, di

navbera xwe de dibêje: “Ev mala mezin bê îv nabe, ka nirînekê li hundirê wê

bikim, belkî min hinek îre dît”. Ew digere û ving-vinga wê bilind tê, ti derî û

deltik lê ne dîtî û pitî mêtî çeliqî, quleke biçûk di bin banî de dît.

Ket hundir, çend caran çav girt û vekirin, ew matmayî maye; Ev titê dibîne xewne lê rastiyeke, ji ana hingan mitire. Kesin derin û hinek jî têt, ref bi ref û dengê solên hin kesan bilinde, wek pozê wan û çoyên wan li ser pita mirovin din nîanan dihêlê; Xwîn ji birînan diherke û viz-viza mêtin re û qirêj, li ser laên wan e. Bala xwe dide wan ku, ling xas, çerm û got qetiyaye û heya hestiyên wanî sipî xûya dike. Ew bê cil û tazî, serî rût, bê por û bi birîn.

’Kut-kuta dil hêt bireve hundirê din, lê çî bibîne; Ew jî bi xwînê mite, ti tit ne maye ku, di xwînê de ne hatî gevizandin. Ew çoyê xeyzeranî, nal-nala

wî ye, reng ji xwînê sor bûye, robareka din a xwînê ji ser danîtokê jî herikiye

erdê û gol-gol miçiqiye. Hinek jî pijiqiye û digel çermên seriyên, mîna xalan li

rûyê dîwêr belavbûne, heya tivingên.. bê lekên xwînê nemane.

Mêa me digere, daxwaza wê cihekî bê xwîn bibîne û lê binê, nefesik xwe derîne. Lê cihên bê lekeyên xwînê nemane û wê demê danîtokê deng lê kir û

got.

-Ey dost, ma te çî windakiriye. Tu yê li van deran, ti caran, gul û sosinên ku, li

çiyayên Bîngol û Sîpanê dipikuvîne nebîne, da ku, hungovîne êrîn çêbikî û
ne

jî rez û tiriyan Amedê û Efrînê. Lê wek tu dibînî, ji bilî rijandina xwîna keç
û

xortên me, ti tit li vir nîne û.. vaye xwîn.

-Birayê nazdar, heya “Pîrkê-Milikdas” ji eslê xwe danagerê. Ez di wê
baweriyê

de bûm ku, ezê êrîniyê li evê mala mezin û dewlemend bibînim. Lê pitî
evê

dîtinê, dipirsim: Ev çiye.

-Ev ne wek te got, maleke dewlemend û zengîne; Ev zîndane û cihê niha
em

têde, oda êkenciyan Ye; Li van deran, keç û xortên me davêjin hebêza min
û

hevalê min; Çoyê Sîndanê bi ser laê wan de tînin xar. Heya wê demê, ço
ti

tit negotibû, bes nale-nala wiye, lê dema navê xwe bihîst ew rabû ser xwe
û

got:

-Hevalê nazdar, lingên te diramûsim ku, tu rûyê min renekî, li ber çavên
mêvanê meyî aza; Tirsê min ji wê tirsê ku, ew biçe çiyayên welêt û ji dar
û

berên wan re, karê ku, pê radibim bide xûyanî û ew rabin diya min a pîr,
ji nav

xwe derînin.

-Bira, kok û bingeha me yeke û em ji warekîne û heya li van deran jî, em
bi

karekî radibin. Lê ti caran em ne bi ya xane, ma ez û te ê û nalînen hev

nizanin; Demê dibe qêrîn û îp-îpa te û çîr-çîra min di bin zarên me de û em

tev giriyên wan dibhîsin û ji êan, cîhanê dihejînin.

Di wê demê de herdu tivingan pozên xwe berhev anîn û ji hev re gotin: “Me

hemû gotinên van bîstin û divê em wan bighînin serokên xwe”. Û devê wan ji

hev dibe.

-Çima ev gi dibe. Hing pirsî.

-Ji ber ku, mafên gelê xwe dixwezin û ji ber ve dixebitin.

-Hevalino, em bi tena xwe wilo di cîhanê de bindestin, xizan û perîanin, ma

dost û hogirên me tine ne.

-Na miletin din wek me bindest û perîan hene, dost û hevalên me jî hene. Kenekî zer bi çov dikeve û dihêle ku, ew herdu çavan bavêjin ser û dilopên xwîna ku, jê dadirivin bibînin. Weke min got: Dostên me jî hene, lê çibkim sed

mixabin, ji Kurdên teres re, ewên welat firotine û difiroin re; Em di bin lepên

neyar de hêtin. Lê baweriya me bi van xort û keçên ciwan tê ku, welêt ji bin

lepên bi gemar û qirêj derînin. Danîtok gotina xwe dibe serî.

-Hey lo.. ooo, hûn dizanin bi evê hatinê, we çavên min li ser pir titan vekirin

û ez ji reiyê derxistim û min birçîbûna xwe jî bi carekê ji bîrkir.

-Hinga nazdar, tu ronakbîrî rewya me, lê divê tu hînbûna xwe bixwe re derîni û li cîhanê belav bikî, divê miletên cîhanê tev zanibin em dijî zor û

sitimkariyê ne. Em jî, mîna miletê xwe, mafên xwe di jiyaneke ahî û xwe de
dixwezin û bila ti caran ji darên çiya û rêlên welatê me û cîhanê, çov û danîtokên zîndana çênekin, bila ji wan tembûr an jî kemanceyan çêbikin û
bidin dest keç û xortên hêja. Bi rabûna ser xwe, çavên hev diramûsin û xatir ji
hev xwestin. Hingê dev da anên xwe û bi rê ve zanî ku, seroka wan; Şaha anê wê jê bi pirse, ka îro çi aniye û gava ew bersiva wê bide, dê mêên-sor ê li
benda wê bin, lê ew netirsî û dev da mal.
Dema gihî mal û zanîn çi pêre çêbûye, rabûn ew xistin zîndanê û ferman “Melîkê”; Eger ku, sibe dahat, gereke basikên wê bikînin û laê wê jî bidin mêên-sor.
Êvar dahat ser rûyê erdê û tîrêjên rokê koça xwe barkirin, Hing jî bi rewa xwe
diponije. Çend hingin ciwan hatin nik wê, temiya mezina xwe negirtin ku, kes
neyê nik wê û xwasteka wan ew ku, zanibin çi bi hevala wan hat. Pitî guhdarî
li çêroka wê kirin, tevdîrek danîn û tevan ji hev re sînd xwar ku, di azadiya wê
de bi dost û heval bin û hunguvinî ji kesên girtî re bi rêkin û jê re gotin:
Tu yê
silavan li wan keç û xortan kî û her yên bi êên wan di êe û bila kêmasiyên me bi borin.
Hing derket û firî û di berbanga sibê de, dema “Melêke” rabû da ku, nimêja sibê

bike, bihîst ku, hinga girtî reviyê û mîletê wê seriyê xwe hildaye. Wê di cih de

andekekî xwe bi rêkir ku, biçê saloxê bide serokê mê ên-sor an û gotê: Tu yê

bêjî ku, “Melîkeya” me, gelek silav li te dike ahê-ahan û dibêje; Mîletê ku, heya roja îro û bi xêra hevaltî û dostaniya we, di bin destên min de bû, ewî îro

serî hildayî û ew li hêviya ku, hûn bên alîkariya wê. Lê ji berî her titî, divê ordiyek ji lekerên wî biçin û hinga reviyê bikujin.

Lekerên mêên-sor bi rê ketin, hinek ketin dû hinga reviyê û hinek jî hatin welatê wê tar û mar bikin. Ji berî ku, ew bighe zîndanê rê li pê birîn û bi gihîtina ku, ew gihitinê re, avêtin ser xakê û çendek ji mêên sor, çogên xwe xistin sînga wê û destên wan li dor sukra wê xelekek çêkirin, lê ji berî Hing

can bibe gote wan.

-Raste ezê nûha bimirim, lê yên weke min pirin; Lewre tevger wê rawestê. Û..

ew mir, lekerên mêên-sor jî, dest bi talanê kirin û “Melîke”, hinguv li pê mîrê mêên-sor rêdixê.

Heleb, 88

BIRÎNA KEFNIKÎ

Di taqê re xwe avêt hundir, bi qirika Heso girt û bi kulma yekem re xwînê di dêv

û bêvilan re avêt. Bi wê nekir, eare ji ber nava xwe derxist, qoqê wî kuta û

mîna cebeek were pelxandin, xwînê xendekên rû kolan û çendekê nûh, di rûyê

Heso de vekirin. Û kesekî mêrxaz, di ber xwe de, got:

-Yek destên xwe bavêjin vî zaroyê û ji ser Hesenîko bidin alî. Hêrsê zaro, mîna ku, wî kesî gotiye, dahat. Dev ji Heso berda, cilên xwe dûzkerin, temriya li ser eniyê belavbûye hilda, nan kir dest xwe, deriyê tirambêleke sipî-dirêj vekir û vîzînî bi tekeran xist, sîngê bajêr, dem û dêlan qelat. Kesên ku, dixwestin nê bibin û yê bi dengê lêdanê kombûbûn, li dora Heso civîn; Ewê dixweze bi gotinekê dilê wî hûnik bike, yan jî birînên wî bibîne. Bi evê bûyarê re, min Heso naskir û dibêjim belkî nûha veriya piraniyên we, ji min tê, lê ne xeme hûn ji min ne çêtirin, win tev li wir bûn û kesekî ji we alîkariya wî nekir, çima loman ji min dikin û nayê xwestin ku, ez ji were bêjim: Çawa gihîtim Heso; Zanîna we, ji hev naskirina me re, bê sûdeye û karên bê sûde, bi taybetî, di qehwa û meyxanan de têtin firotan, bi devê zana û rêzanan û ez ne ji wan im.

-Heso.. . Eger ku, tu çayekê çêbike, emê digel cixarekê û bi helez, li ser vê pakêta li pê nangehê, “firnê” Vexwin. Bi bihistina navê Heso re, ew bê deng ma, çav tijî hêsir û pêlên bîranîna, di ser hev re hatin û herkîn.

-Çima tu digrî? Çavên min bi tiliyên wî ketin, min nedît ku, di ewê bûyarê de

ti movikên wî firîbûn û xûyabû wî ramanên min naskirin, lewre û ji nikave destê xwe veart û bi hêrs li min nihirî.

-Çima bala te li destê min eÛ.

-Ez nizanim çî bêjim, bes bawerim ku, ev birîna te kevîne û ne ji ber bûyear wê rojêye.

-Ew ji te nayê xwestin ku, tu zanibî birîna min kevîne yan nûye. Û bi gotinên

xwe re, di hundirê nangehê de wînda bû û pitî demekê serî dirêj dike, hilmeke

germ ji bêvilên wî dikie, siya Heso dirêj dibe û dibe, rûye wî û çaydanê çayê,

di derî re derdikevin, lê kesekî dine; Eger ku, min nizanîba ez û wî, di nîvê evê

evê de, bi tena xwene û ya bêtir, eger ne ji tiliyên wî bana, min ê bigota kesekî din dertê; Ew hêsir, rûyê Diloan, dil-hênikiya wî, bi carekê hatine ewtandin û arî, hovîtî û dilreî li ûna xwe hêtin. Tirsê, dilê min girt û ew berkenî dibe, belkî ev cara yekmîne ku, dibîne piçek, ji hovîtiya teban bi wî re jî

maye û dikare kesekî bitirsîne, wî titî hêt ku, ew hinekî bi mêraniya xwe hest bibe.

-Tu dixwezî zanibî çîma movikin, ji tiliyên min firîne.. neÛ.

-Ger tu bi wan bûyeran di êî, naxwezim. “Tif li du-rûya.. xwe dikim, çîma tu

nizanî ew pê di êe, hey bê rûmet, çîma tu derewan dikî û dibêjî: Eger ku, pê di

êî, naxwazim bi bhîsim, tu ji qumsiyê Beko derwîntirî, ger ku, tu wilo bibêjî.”

-Na, dixwezim derînim. Dengê wî, ramanên min dizîn. Ev bû bîst û pênc salin
ku, wan ser dil girtiye û wek tu dibînî; Temenê min gihitiye çel û titekî, bê zanav, pîrek û mal.. heya bê nivîn û balîv. Nangeh, jîn, dem û warê min e; Xwarin, xew û.. . Hinekî rawestî, cixareyek pêxist û dûyê wê golên bîranînan,
bûyarên kevin vegerandin.
Fît-fîta Hesoye di zuqaqên gund de, berê xwe daye mala birê xwe. Dema ku, ew
li hemberî gund rûnitîbû û temaa malan fikir, belkî keçekê di deverekê de
bigre, dît kesek derbazî mala bira yê wî dibe, ji cihê xwe hilbû û daket.
Ji berî ku, ew xwe bi bêdengî li hundir badê û li ber derî hindekî rawestî û ji xwe
pirsî: “Gelo, çima di vê germê de, van derî niv girtîkirin e”. Lê gêra ber dilê wî
nekir; “Dibe ku, ji bo toza bênderan wilo kiribin”. Bi ketina hundir re, çav di
serî de sorbûn. Gotin, hêsir û xwîn di lêe de silbû û zemîn li ber çavan re bû,
bi rabûna wî kesî re, ji hembêza pîreka birê.
Qêrîn bi pîrekê ket; Çawa wî rê ji xwe re dît û ewê bê ferman bikeve hundir û bi
dengê wê re, ew kes gihîte ber derî. Heso xwest rêya revê li pê bi bire,
destek hilat û kêra di dest de, hin movik ji tiliyên, wî firandin. Pîrek jî gihîst
gedûkê, hawara xwe ji gund xwest. Cîranên nêzîk û dûr kombûn, ew ji nav
lepên wî derxistin û jê pisîn, lê deng bi Heso neket û li hemberê, devê jinikê

nakeve hev, hawara xwe dike xelkê gund ku, wê ji nav lepên vî teresî derînin;

Evê dixwaze rûmet û seriyê birayê xwe berdê erdê, bi anîna erê xwe bi ser wê de.

Dema xelkên gund ev gotina bihîstin, xwatin Heso bi perçiqînin, lê li dawiyê ji

xwe re gotin: “Çiyê me jê heye, ma ne tolazî û rûmet ya wiye”. Û her yekî devê

xwe tijî xwazî kir, û...

Ro çû ava, kesên malbatê tev civîn. Heso di civatê de, devê xwe vekir, lê piraniy wan jê bawer nekirin, bilî dê û nemaze mêrê jinikê qêriya û çend eqam

gihandin wî. Ji wê rojê û virde û vaye bû bîst û pênc sal, ew venegeriye gund û

heya nema dihêle laê wî jî vegerînin wir. Bi dawiya çêrokê re, Heso rabû ser

xwe û bi hêrs bi qirika min girt, ez têvedam û ew kete hundirê nagehê û banga

dawî li minkir.

-Nuha te çêroka min naskir, eger carek din, tu bi ber çavên min kevî, tu yê

deynê gundê me... Dengê Heso dê di koeyên xaniyan de bipelixe û ewê negihe min; “Kîne evên alavan digerînin”. Heso serî ji ser balîv rakir û ber

bi

alavên kar çû, dît ewî bi xwe li ber tûrin sipî sekiniye û devên wan yeko-yek

vedike û li ûnê êrd laên zarokan berdide hundirê hevîradanê, “ecanê.”

Morîk guvat, serî, mil û pepil li hev hatin alandin, hevîrekî ji xwînê û got, bir ber tengikdanê, “reqaqê” û.. pel-pel ji wan derxist, li ser têxit rêxistin û her

çar bi hev re xistin mal-agir; Hin zaro çîl-sipî, hineke sor û hin jî re-ewitî dertên.

-Hesenîko, çar kîlo ya bide min. Seriyê xwe bi aliyê taqê de bada, da ku, peran

ji wî kesî bistîne; Dêwa pêiya nangehê, zuqaq û bajar tijî kirine.

-Nelezînin, têra we tevan heye. Heso got.

-Ev bû deh sal, li benda sitandinê me, lê her tu nasê xwe dixîni pêiya min. Dêwekî vegerand û Heso berkenî bû; “Ma kengî dêw û kole bûne dost”.

Dêw ji

kenê wî zirtbû, diran di zendê Heso de çikandin; Kêreke ko, mîxin zingarî û di

paniya yekî de biçin xwar. Ewa na ê kutane dilê wî û nêem ji birînan herikî. Bi girîz û xwêdanê hatiye ûtin, ber bi alavan bi rêket, ne xwîn û ne jî seriyê zaroyan; Xewneke ji evên dawî bû û baraneke mîxî di serî dabû, dêv dide malagir

û henefiyê mazotê vedike, avêtina zilê ixatê, Dojehê diyar dike.

-Ev çi ye?! Xwe e.. pir xwe e, min ji vî seg-bavî re hotêl vekirî, ne bes e dixwe.. vedixwe.. . Xew bê pere.. hîne bi ser de êgir berdide mala min.

Hesenîko, çima mal-agir pêketiye. Lê xwediyê nangehê ti dengan nake, lê dema

ku, ew ber bi mal-agir diçe, çavên wî bi komeka arî yê dikevin.

Heleb, 90

**

EPILOG

HESENÊ METÊ

avesta EDEBİYAT: 73 14

Epilog

Heseng Mete

Edttor: Abdullah Keskin

Dizayna Berge: Ahmet Naci Fırat

Tashth û Mizanpaj: Avesta

Çapa Yekem: 1998, Stockholm, Nûdem

Çapa Duwem: 2000, Stenbol

Çap: Berdan Matbaacılık

Hejmara Çapg: Du hezar

© Hesene MetS-Avesta

Ji xeynî danasine beyî destura nivtskar û weşanxane

bi tu away! naye koptkirin

NMskar, ji bo maji telifi e çapa duyemîn

a ve kitebe "ae\üneke darın" xwestiye

AVESTA BASIN YAYIN

REKLAM TANITIM MÛZtK DAĞITIM LTD. ŞTİ.

Meşrutiyet Caddesi

Özbek tşhanı 136/4

BEYOĞLU / İSTANBUL

Tel: (0212) 251 71 39

Faks: (0212) 251 44 80

istasyon Caddesi, K. İsmail Pasa 2. Sokal.

Abdi Pasa Apt. Giriş Katı

OFIS / DİYARBAKIR

Tel-Faks: (0412) 222 64 91

ISBN: 975-7112-82-8

Hesene Mete
EPILOG
avesta | ÇÎROK

HESENE METE- (1957) Ji Erxaniya Diyarbekre ye, ev bi qasî 20 salan e ku ji wan deran dûr e, li Swede dijî. Kitebgn wî yen ku heta niha çap bûne ev in: Smîmoff (çîrok, 1991), Labîrenta Cinan (roman, 1994), Epîlog (çîrok, 1998). Hin kurteçîrokSn gelert bi formeke edebî hûnandine û bi nave Arâû (1991) çap kirine. Ji xeyn! van ki-teban Keça Kapîtan (1988) a POşkîn, çend kurteçîroken Çehov bi nave Mirina Kar-mend (1989), romana Dostoyevskî Meriverî Reben. (1991) wergerandiye kûrdi. Smlr-nojfff, Labîrenta Cinan û Epîlog di nav weşanen Avesta de ji nû ve t8ne çapkirin.

NAVEROK

Eş/9

Nakokî / 60

XoceXizir/68

Monsieur et Madame N. / 76

Panorama / 84

Wellee / 96

Evîneke melodramîk / 102

Kubarname/

115

Yasitar/122

(ÇÎROK)

EŞ

"Xwezî anuha ev gotinen min bihatana nivisandin!

Kvîezî di pirtûkekê de berhev bibûyana!

Bi penûseke hesinî, bi (jurşûne"

zinaran bihatana kolane ku her û her bimana."

Li

(Tewrat: Hz. Eyub XIX:23-24)

Prolog

Ji bo ku ev çîroka ha were nivisandin, wî bi bejîngan titûn ne kişand, bi kupa şeraben kevnesalan venexwar, gund bi gund ne geriya û mijar berhev ne kirin, bi dehsalan li ser ne sekim û le hûr ne bu, wekî mirîdan çaven xwe ne girt û guhdariya aliman ne kir, li civaten eşîran rûnenişt tîzbî di nava tiliyen xwe de li ba ne kir û mîna dengbejan ne lorand. Bi gotineke din, Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve serpehatiye ev çîroka ha ne nivisand.

O we şeve, dema ku wî qelûna peşîn ji titûne dagirt, dema ku agir berdaye û duman bi ser xist, ku ez ne li ba wî bûyama, a di we gave de ku ez ne bi wî re bûyama, bi du hezar û du caran ez sond dixwim ku anuha ev çîroka e ne di destê we de buya.

Le dîsa jî, dîsa jî ez dizanim ku kesek e bi van gotinan ba-

wer neke le... wek ku min got, di we gave de li ba wî deng tü ne bû, ronahî tüne bû, wext tüne bû, Xwede tüne bû, dünya li dora xwe çerx ne dibû.

Û ev hat male.

11

Monolog

Maleke weke gelek malen beyî jin û zarok e. Ji ode û aşxaneyeke piçûk pek hatiye. Ji dîwaren ve ode, dîware hember bi çend refiken pirtûkxane hatiye nixumandin û di ser pirtûkxane re jî portrekî Ahmede Xanî dardakirî ye. Li dîware hela raste jî portrekî mîr Celadet Alî Bedincan ji profîlekî çepe ve hatiye dardakirin ku çav û awuren wî li pirtûken refikan e. Li rasta ode, di navîna du sandaliyan de maseyeke piçûk heye. Çend name û rojnamen ku diyar e hîn venebûne, qelûneke xwar û kevnar tev lepek titûna raxistî li ber kîsekî dermanan li ser ve masa rasta ode ne. Li quncikekî jî maseyeke kare nivisandine bi penûs, bi defter, bi makîne û bi gelek tiştên weke van tiştan dixuye.

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke tev salen xwe î ce li, tev potîn û qapûte xwe î payizî anuha li ber ve mase rûniştîye. Ji ve tevgiredana wî jî baş diyar dibe ku hîn nû ji derve hatiye. Bi herseke vekirî, bi daxwazeke wusa veşartî makîne tilî dîke û dikute ku meriv dibeje qeye li ber berhemeke giran rûniştîye, meriv dibeje ji bo hemû dewr û dewranan dinivîsîne, meriv dibeje herkes e rabe ji xwe re lezet û maneyeke je derxe. Le na, piştî rezeke duduyan kaxize ji ber deve makîne derdixe, le dinere, bi herseke bilindtir di nava deste xwe de di-

guvişîne û we jî daveje selika keleka xwe. Piştî çend çaren we-
ha çeqîn û çilpîna makîne hedî hedî giran dibe, tenik dibe û
deng je te birîn. Selika li keleka wî ji kaxizen guvişandî tije di-
12

be û di dawiya dawîn de wan tiliyen xwe yen bi hûner dide ber
eniya xwe, di ser makîne de xwar dibe û diponije.

Bi qasî çend hilman bi ve rewşe dimine, dû re ji nişka ve se
re xwe radike, peşiyê bi tirs û paşe jî bi hers ji ser sandaliye ra-
dibe, makîna xwe radike û li erde dixê. Mîna yekî har û çav-
sor ve çare bi nefrîn li dora xwe dinere û di we gave de ew çav
ven sor li portre mîr ase dibin. Bi we herse, bi we tirşe ji niş-
ka ve xwe radikeşe portre, ji dîwer dadixê, di des-
t xwe de le dinere, mîna ku pe henekan bike deve xwe jî le
xwaromaro dike "Zilamek û zimanek"* dibeje, denge xwe
berztir dike û di ser de diqîre:

- Ev çi re bû te da ber xelke, mîre min, ev çi ilm û îrfan bû!
Xwendin û nivisandina bave min tûne bû... di dema wan de
dûnya ne gilover bû, di dema wan de dûnya li dora xwe ne di-
zivirî le... le dîsa jî bextiyar bûn!

Bi van gotinen xwe re dest û lev le dilerizin, çaven wî di
kortalen xwe de dilîzikin, portre mîre xwe li erde xweş dike û
dike ku wî jî weke makîna xwe li erde bide. Le tavile poşma-
niyeke digire ser, hersa wî dibe diltenikiyek û li ruhe wî belav
dibe. Mîna ku doza leborîne je bike ve çare jî portre mîr dide
ber ruyê xwe, bi xemgînî û çaven avî bi ciyê bere ve dizeliqî-
ne, bi rewşeke jihevketî sandaliye li xwe diguhêre û te li ber
masa rasta ode cî dide xwe.

- Nabe, mîre min, nabe... ne bi sitran û ne jî bi gotinan, di beje, herdu desten xwe ber bi perçen makîna xwe dike û bi behneke feretir û bi dengê nermtir dîsa didomîne: Her cara ku ez li ber ve kambaxe rûdinim, tu dibejî qeye ez li ber kewara mozan rûniştîme, mîre min, ez dibem qeye ez bi denge-

* Zilamek û Zimanek: Nivîscfec Mîr Celadet Alî Bedîr-Xan e ku bi nave Herekol Azîzan

di Haviara hejmara 40ê de çap bûye. Li ser cihuyekî ye fcu çawa zimane xwe îbrani

piliye tene li mala xwe bi kar aniye û dû re bûye zimane welat û dewleteke. (W)

13

kî bilind derewan dikim û herkes jî dibîne, herkes dibîne û guhdariya min dike. A we çaxe jî... we çaxe jî behna min teng dibe, mejî li min ditevize, dest li min giran dibe, şerm, tirs û hers li min peyda dibe û ez nikanim. De ka ji bona Xwede tu riyeke bide ber min, mîre min... xelk çawa dinivîsîn, cima ew hîkmet û ew cesaret li ba min tune?

14

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke qelûna xwe ji titûna raxistî dadigire, agir dike, dûmane bi ser xwe dixê û giran giran dibije:

- Ez dizanim, mîre min... ez dizanim anuha tu e mereq bikî û bibejî: tu cima dixwazî binivîsîn, te cima dest bi vî karî kiriye? Pirseke weha, rasterast pirseke weke ve pirsê cenabe te min jî ji yekî wekî xwe kir. De îcar tu dizanî ka be bersiv çî bû,

mîre min? Digot:

"- Min dest bi pirtûkeke kir ku ez bixwînim. Piştî ku min peşgotina pirtûke xwend, hîs û baweriyeye wusa li min peyda bû ku ez binivîsînim, min jî edî dest pe kir." De îcar ji kerema xwe re destûre bide min, ez e anuha ji te re wan gotinen peşîn bixwînim, mîre min, gotinen ku tavile merivan dike niviskar, dibeje, radibe ji refikeke pirtûkeke derdixe û li ser lingan dixwîne:

"Binivîsîne! îllam binivîsîne! Şerm neke, netirse. Edebiyat xweş e, binivîsîne!... Dive tu binivîsînî. Nivisandin baş e. Çi dinivîsînî binivîsîne. Hemû tiştên nivisandî baş in. Li ser çi dinivîsînî binivîsîne. Ji ber ku hemû tişt ji bo nivisandine hatine afirandin. Li ser nivisandina hevale xwe binivîsîne, peşine doste xwe bide, peşine niviskariya wî bide. Dive em peşine hev bidin, dive em peşine hev bidin ku em bilind bibin. Peşin xemla meran e..."

Li vir deste xwe li ba dike û bi tinaz, bi enirin di ber xwe

15

de: Bi qurbana mere xwe bim, dibeje, bi hers û dilverîşîn tev wan gotinen peşîn pirtûke ber bi quncikekî ode daveje, hedî hedî qapût ji navmilen xwe dike, li aliyekî sandaliya xwe datîne, di rûniştine de li portre mîr jî dinere û dibe:

- Ev tiştên weha rasterast şîreten Ptahhoteps* in, mîre min, te got çî? Çar hezar salan beriya nuha ciwamer li ser çerm û keviran lîteratureke weha ava kir û xuyaye di wan deman de maneyeke xwe jî hebûye. Le ku tu ji min bipirsî, piştî evqas salan meriv rabe û di roja îroyîn de jî ji bo peş û paşîya pirtû-

kan gotinen bi vî rengî bibeje, meriv e edebiyateke zorgayî peyda bike. Tene edebiyateke zorgayî û ne tiştêkî din. Zorga dibejim.... ilme te fere, zimane te xurt e, mîre min. Li ba me dema ku nogin ji wexta xwe dereng dikevin, em ji eleta mangeyeke biga tînin di dawa nogine re didin û paşe em conegan le dicivînin. Li vir em wan conegan dixapînin û nave vî kerametî jî bi zimane me gundiyan zorgayî ye, te got ere? De îcar anuha em vegezin ser pîrsa te û nivisandina min. Ev çîrokek direj e, mîre min, çawa bibejim. Dibejin ku tu keran li ba keran giredî ji hev hînî tir û fisan dibin. Le ez bi xwe ne li ba wan bûm, mîre min, ez ne di nav wan de bûm. Ê hîn jî ez û vî ka re nivisandine ji hev dûr in. Beriya ku daxwazeke weha li min cebe... û ez ji mîre xwe re bibejim, daxwazeke weha jî tucarî li min çenebûye ku ez jî navekî niviskariye bi pey xwe bixînim, pe bifirim û xwe bilind bikim. Bi gotineke rastir, beriya ku ji naçarî dest pe bikim û bixwazim binivisînim... (deste xwe ber bi we selika kaxizen xwe direj dike) beriya ku ez bixwazim tiştêkî weha bikim, ez çel carî bi bapeşe ketim, ez çel cari bi zikeşe ketim, bi ewqas çaren din lingen min şemitîn û ez li erde ketim.

* Ptahhoteps: Yek ji wan naven lîteratura feamiliye ye ku nivisen ji du hewî zar salen beriya Mesîh û heta nuha haline parastine. (W)
16

Li vir xwarî bene potînen xwe dibe, vedike, ji lingen xwe derdixe, li keleka xwe datîne û di ber xwe de didomîne:
- Veca... cima min xwe daye karekî weha, cima ez dixwazim binivisînim, ez e anuha ji te re çîroka ve çîroke bibejim,

mîre min.

Dûmaneke tîr û tarî di dev û poze xwe re dike der, bi awuren hişk li mîre xwe dinere û:

- We çaxe... di wan deman de cenabe te tüne bû, dibeje, deste xwe ber bi hela portre Ahmede Xanî bilind dike û dido mîne:

- Cenabe seyda jî li vir tüne bû.

Mîna yekî ku radest bibe ve çare herdu desten xwe bilind dike, sere xwe li rast û çepe xwe dizivîne:

- Le wekîdin hertişt, hertişte ve male we çaxe jî... se sal be re jî wekî xwe î anuha bû, dibeje, wan desten xwe li hev siwar dike, dide bine argûşa xwe, hinekî difikire, kesereke bewext vedide û li gotinen xwe zede dike: Cenabe te jî dizane ku dûrketina ji mal û warekî bav û kalan çawa ye. Piştî eşa dûrketineke bi qasî şanzdeh salan ez û biraye xwe î mezin, em digehîjin hev. Roj û evar... dîsa roj û evareke weke anuha ye, mîre min.

17

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve bûyere xwe li eşa hundure xwe germ dike, hedî hedî dikeve ber û ji mîre xwe re vedibeje:

- Piştî ewqas salen dûrûdirej, bi qasî saeteke heye ku min biraye xwe î mezin dîtiye û min ew ji balafirgehe haniye mala xwe. Wek ku min got, mîre min, mala min jî dîsa ev mala ye, ev ode û ev aşxana piçûk e. Di ve saeta ku ez û biraye xwe bi hev re ne, min jî weke herkesî li ser lingan tene tiştên sivik û berbofî je pirsîne. Bi gotineke din wek çîrokbejekî çikos ez

dixwazim hindik hindik je bipirsim û bi qasî bîst û yek rojan guhdariya wî bikim. Her cara ku ez li ser van tiştan difikirim, tiştên ku ez e je bipirsim û ew e jî bibersivîne, pejnen dÛr û nezîkî aqilan li min peyda dibin, wan bergehen beriya ewqas salan tînime peş çaven xwe, bi dilekî tenik, bi beri û bi hezkirin ji hela aşxane dizivirim ser aliye ode ku li biraye xwe î mezin binerim û gotineke je bibihîsim. Biraye min li ber ve pirtûkxana oda min sekinîye, herdu desten xwe çeperast li ser sînge xwe giredane, bi kef û mereqdarî li pirtûken van refikan dinere û dema ku hay ji min dibe, sere xwe jî bilind dike û bi qedir û qîmeteke bilind dibeje:

- Te pirtûxaneyeyeke dewlemend heye.

- Ere, dibejim, ez jî yekî wusa me ku... çî pirtûk bi dest min bikeve ez e bixwînim û dû re jî ez e di dereke ve pirtûkxane de bi cî bikim.

18

- Ev xwiyekî te î bere ye, Darîn. We çaxe jî te ji defter û pirtûkan hez dikir, hîn di wan deman de jî min tederdixist ku tiştêk e ji te derkeve.

Em herdu jî bi qedre hev dizanin. Ez qedre wî dizanim ji bo ku ew biraye min î mezin e û ew jî... edî Xwede dizane be ji ber çî rûmete dide min. Biraye min desten xwe ji ber hev derdixe, destekî xwe ber bi heleke pirtûkxane direj dike û didomîne:

- Ev hela bi tirkî ye, xuyaye ev hela jî bi zimane vir e...

Ji pirtûkxana xwe wan refik û aliyan mayî jî ez bi wî didime zanîn û dibejime:

- Ev aliya jî bi zimane male... bi kurdî ye, keko.

De îcar te ne dît le di we gave de ez dibînim, mîre min. Bi we peyva kurdî re ez dibînim be çawa çaven biraye min dibriqin, çawa ken û kef je difûre û xwe betir ber bi wan refiken hela kurdî dike. Yeke je derdixe û bi dilpekîn çaven xwe di ser de mezin dike. Bi min wusa te ku di we gave de ledanen dile wî xurt û zedetir dibin û ez jî dibihîsim, mîre min.

- De kerem bike, keko, dibejim... min nan û penîr daniye, tu kerem bike em tiştêkî bixwin û hedî hedî ji min re behsa wan deran bike.

Le tiştên ku ez dibejim keke min nabihîse. Mîna yekî kwîr deste xwe jî di berga we pirtûke re dide û ez dibînim be çawa pe şa dibe.

- Ere, dibejim û didomînim, tu dû re ji xwe re yek bi yek e*

le meze bikî û bixwînî... û ku te bive hinekan jî bi xwe re bibe. Ma te xwe hînî xwendina kurdî kiriye, keko?

Biraye min leztir dike. Ji refiken pitûkxane yeke derdixe, yeke dikiye û beyî ku li min binere di ber xwe de dibeye:

- Na, ez hinek tîpan ji hev dernaxim... le ne pewîst e ku me-
19

riv bixwîne. Bi rastî jî hûn li van deran karen heja dikin û ev tera me dike.

Bi serbilindiyeke veşartî di dile xwe de dibejim: "Çi maqûlen tegehîştî û heja ji mala me derketine." Dû re ez wan gotinên xwe duçar dikim û dîsa dibejim:

- De kerem bike, keko... kerem bike bila çaya me sar nebe.

Le keke min dîsa kerem nake, mîre min. Ew her meşqûlî pirtûkan e û kare xwe dike. Yeke ji dereke dikişîne, le dinere û dîsa dixê şuna we, yeke din derdixê dîsa wusa dike, yeke din û yeke din. Mîna ku li tiştêkî bigere li berg û rengen van pirtûkan dinere. Ji kefxweşiyêke leven wî dilerizin û li ser hev direqisin, le ez nizanim be ji ber çi ye. Dû re bi pişirin, bi hevî, bi bextiyarî bere xwe bi min de dike û dibêje:

- Nave te î li vir çi ye, Darîn?

- Nave min, dibêjim, nave min î li vir jî Darîn e, keko.

Biraye min bi rûkenî, bi dilpekî ve çare herdu desten xwe jî ber bi refiken pirtûkxane vedigire û dibêje:

- De ka tu bi xwe tiştêkî xwe deneme ez le binerim, lo!

- Tişte çi, keko?

- Pirtûk, pirtûken ku te nivisandine.

Li vir ez peşiyê hinekî sar dibim, dû re şerm dikim û Xwede dizane di jiyana xwe de ev dibe cara peşîn ku ez dikevime rewşêke wusa teng, mîre min. Le beyî ku ez ve sar û serme li xwe bidime der tavile dibêjime:

- Pirtûken çi? Min pirtûk ne nivisandine ku... Ez nanivisînim, keko.

Ez dibînim ku bawerîya keke min bi van gotinen min naye, mîre min, ez dibînim ku naxwaze pe bawer bike. Herdu çaven xwe ber bi min piçûk dike, dinere û bi dengêkî zuwa dibêje:

- De qeye tu henekan dikî, lo!...

20

Le ez bi awayekî beguman pe didime zanîn ku ez henekan nakim, ev kara ji min naye, dibêjim û dû re je daxwaz dikim

ku em li ber texte xwarine rûnin, ez je daxwaz dikim ku ew tekeve ber û hedî hedî ji min re behsa wan deveran, behsa de û bave min, behsa malbata me bike. Le ez dibînim be di we ga ve de çawa ew dilpekî û rûkeniya bi gaveke bere li ser ruye bi raye min wenda dibe, mîre min. Ez dibînim be ew leven wî yen ku bi gavekî bere dilerizîn anuha çawa daketine. Bedii û bi rewşeke jihevketî ber bi aşxane te û di ber xwe de dibeje:

- Ez ne birçî me.

Li ba me, mîre min... li ba me dema ku meriv li mala yekî nan nexwe, te we mane ku meriv sil bûye. Le beyî ku ez ve tevgera wî eşkere bikim je re dibejim:

- Tu çawa ne birçî yî, keko? Ez dizanim we tene di balafire de nan xwariye û ew jî ji nîvfo de ye, ne wusa?

- Nizanim, dibeje, le anuha mîna ku tew dile min naçe xwarine.

- De kerem bike, keko, dibejim, kerem bike em bi hev re bixwin û ji min re jî behs bike, behsa malbate, çelî eşîre bike û bibeje ka kî miriye û kî maye.

Biraye min bi we rewşa kefrevîn:

- Na, dibeje, sikir ji Xwede re tiştêkî wusa ne qewumiye ku tu pe xemgîn bikevî. Mala me jî û ez dikanim bibejim hemû endamen eşîre jî baş û silamet in. Le çav û heviya herkesi jî li te ye. Bavo... bavo digot, je re bibeje bila me rûreş û şermesar dernexîne.

Bi van gotinen xwe re biraye min li ber texte xwarine rûdine û bi mirûzekî tirş piyala çaye ber bi xwe dikeşe. Di we ga ve de gumanek li min jî çedibe, mîre min. Gumanek li min çedibe ku hinek xernexwazan tiştina li hev hanine û bi wan ra-

gehandine. An ne, ma bave min e cima bi min bide zanîn ku ez wan rûreş dernexînim. Bi mitûmatî li biraye xwe dinerim û dibejim:

- Ka raweste, keko, ev çi gotin e! Rûreşiya de û bave min gunehkariya heri dawîn e ku ez li ve dunyaye bikim. Ê dema ku ew gava jî were, dive ez edî bimirim û viya de û bave min bi xwe jî dizanin. De ka anuha ji min re bibeje... ma ez e çi bi kim ku pe de û bave xwe rûreş dencînim, keko?

Biraye min bedii çaya xwe li hev dixê, bi min dide zanîn û dibije:

- Daye" û bavo jî bi ve yeke dizanin. Loma... loma digotin heviya me ji Darîn heye. Heviya me heye ku ne tene yek û du du, ew e gelek binivîsîne.

Ez bi pirs, bi tirs le dinerim û dibejim:

- Çi binivîsîne?

- Pirtûkan, pirtûken qelew binivîsîne ku me jî û... wusa bi ke ku me jî û tevayîye eşîre jî pe serbilind bike.

Ku ez li xwe mikûr werim û bibejim, ji van tevger û gotî nen biraye xwe ez tiştekî fam nakim û tiştek nakeve sere min, mîre min. Biraye min ji bo min dibe kewareke devgirtî û nizanîm be çi te de heye. Mitûmatiya min dikeve renekî din û je re dibejim.

- Na xwe ji bo ve yeke ye ku bavo gotîye: bila me rûreş dernexîne?

- Bele, dibije, ma ev hindik e... bi îsrar digot: Je re bibeje, heta nuha jî me nav û dengê wî ne bihîstiye, digot bila ji me

re bişîne, bila binivisîne, bila werîne.

Bi van gotinen wî re behna min te ber min, mîre min. Ew tirs û gumana naxoşiye ji ser min radibe, baweriya min li min xurtir dibe ku min tişteki naxoş ne kiriye, min tişteki naxoş

22

ne kiriye û pe bave" xwe rûreş dernexistiye. Ji bo ku betir tebigehîjim ka çîrok çî ye, ez bi mereqdarî je re dibejim:

- Biraye min î ezîz, ez tenagehîjim cima pirtûkan binivisînim, cima sere eşîran di ber pirtûkan de bilind dibin. Eşîren ku ez dizanim ji bilî pirtûken pîrozwer nave pirtûkan ne bihîstine û em hemû jî pe dizanin ku xwendina wan jî tune ye. Mîna ku bi serhişkekî re bipeyive biraye min li vir deste xwe jî li ba dike û:

- Ere ere... dibeye, le ne pewîst e ku xwendina meriv hebe. Ez ji te re dibejim, îro li ba me nivisandina pirtûkeke ji bo malbateke serbilindî ye. Kemasiyeke pir mezin e ku edî ji malbateke yek ranebe û pirtûkeke lneke.

- Ya sitar, dibejim.

- Bele, dibeye, ape Gurgîn digot, em li bendî Darîn in, em li bendî ne ku pirtûkek qelew binivisîne.

Ez dîsa zîq li çaven vî biraye xwe î mezin dinerim û dibejime:

- Bi rastî jî ez tînagehîjim, keko.

- Çawa tenagehîjî, malava! Ape Gurgîn digot, em li bendî wî ne ku pirtûkeke, yeke qelew binivisîne.

Xwezî te ape min î Gurgîn bidîta, mîre min, ku te ev ape min bidîta te e baştir bi ve kula dile min bizani buya. Ez li bi

raye xwe vedigerînim û dibejim:

- Baş e, le tu çi dibejî?

- Ez jî wusa dibejim, dibejim binivisîne û bila em ji xelke ne kemptir bin. Ne ez... ne tene ez, meta Xane jî digot je re bi beje em li bendî wî ne, digot bila tev pirtûken xwe ew jî were û ji me re, ji xelke re behs bike.

De îcar... ku ez ji te re çelî v meta xwe bikim, çîrok e pir direj bibe, mîre min. Le ku ez ji mîre xwe re bi kurtî bibejim,
23

ev meta min ji herdu çavan jî kwîr e. Loma ez hinekî jî bi eni rin li nava çaven biraye xwe dinerim û:

- Binere, keko, dibejim, tu biraye min î mezin û ronîya her du çaven min î. Le bi rastî jî ez tenagehîjim be cima we karû-baren xwe berdane û hûn bi pey tiştên vala, bi pey pirtûk û ni visandine ketine. Ku we pere, mal û milk ji min bixwesta, ku we bixwesta ez jî nola hinekan bibim xwediye mal, jin û zarokan... ez e we çaxe tebigehîştama. Le ez dinerim ku tu hîn jî dibejî pirtûk û binivisîne.

- Bele bele... wek ku min ji te re got, li welet edî xelk behsa pirtûkan dîkin. Amoja bavfile digot: Ji Darîn re bibeje, ma bi qasî lawe mala Garût jî nabe. Lawe mala Garût hatiye, çelî pirtûkan kiriye, çelî niviskariya xwe kiriye, peşine rûpelen pirtûken xwe daye û gotiye: "Meriv li wan deveran pir baqil dibe." Daye jî li wir bûye. Daye jî bihîstiye ku lawe mala Garût serî her rûpel û her pirtûkek xwe çiqas pere girtiye.

Li vir ez edî dibînim be biraye min çawa daye nav û dibije.

Û ez serwextî tiştêkî din jî dibim, mîre min. Serwext dibim ku

bi rastî jî pirtûk û nivisandin bûye mijar û ketiye nava xelke, bûye benîşt û di wan geriyaye. Le dîsa jî ji bo ku zedetir sere xwe di ber van tiştan de neyeşîne, ez li biraye xwe vedigerînim û je re bi kurtî dibejim:

- Binere, keko... kî hatiye, çi gotiye, ew bi min û we ne ketiye. Niviskarî ne kare min e û tişteki weha jî ji min nexwazin. Wek ku min got, ku we pere ji min bixwesta, min e biçûya deyn bikira... min e biçûya bidiziya û ji we re bişanda. Le ni visandin û pirtûk... meriv nikane van tiştan deyn bike, meriv nikane bidize jî. Ji min naye, ez çi bikim...

Mîna ku ez bi van gotinen xwe gunehkariyeke dikim, bira ye min zûzûka peyve li min dibire û dibije:

24

- Wusa mebeje, Darîn, çawa ii te naye. Ji bona Xwede me rûreş dernexîne. Bi Xwede daye digot je re bibeje: ku ew pir tûkeke nenivisîne ez e şîre xwe le helal nekim.

Ev cara peşîn bû, mîre min... cara peşîn bû ku diya min şîre xwe li min heram dikir. De îcar te diya min bidîta, mîre min. Diya min a reben, diya min a şîrpak... dilovaniya diya duwanzdeh pexemberan li ba diya min hebû, mîre min... û wek ku tu dibînî anuha jî rabûye ji bo nivisandina pirtûkan şîre xwe li min heram dike. Li ser van gotinen biraye xwe ez tiji dibim, sîng li min diwerime, denge min bi hers bilind dibe û ez je re dibejim:

- Nivisandin cima dikeve navîna min û şîre diya min! Ez û nivisandine ji hev dûr in, tişteki wusa ji min naye û ez nikanim.

Biraye min jî bi herseke qasî hersa min li min vedigerîne û dibeje:

- Çawa ji te naye, Darîn! Mebeje ez nikanim, wexta ku tu li wir bûy, me digot merivekî mezin e ji te derkeve. Xale Berot digot je re bibeje: Bila ji bîr neke ku şeref û heviya me di destê Xwede, di destê wî de ye. Bila ji bîr neke dema ku dixwend, di her çûyîna bajarê de min li ber dîware dibistane du panotên hesinî didaye... digot, bila ji bîr neke ku we çaxê min ew panotên hesinî ji bo rojê weha dida wî.

Mezinî... li ba me mezinî tiştêkî pêrozwer e, mîrê min. Em bi simbeleke nûkurkirî dernakevin pêş mezinêkî xwe, li pêş mezinêkî xwe nabe ku em titûne bikeşin... (hilmêke dawîn ji titûne dikeşê hundurê xwe û qelûne di ser xwelîdanê de derxûm ditepîne) nabe em bi deng bikenin. Le bi van gotinan wî re beyî ku bibejim ev biraye min î mezin e... li vir kenekî wusa ehmeqane bi min digire ku heta nuha jî li pêş mezinêkî ma-

25

le ez bi vî rengî û bi vî dengî ne keniyame, mîrê min. Dû re li ruyê wî dinerim:

- A ji te re, dibejim, de were safî bike! Xuyayê tevayîya eşîra me gotinan xwe kirine yek û bi te re şandine vir.

Deng ji biraye min naye. Ez bala xwe didime ku di her hevokê û gotinê de min de gwîne wî betir divemire û renge hevîyeke şikestî le zelaltir dibe. Mîna ku ji xwîna bave xwe vexwe, di her firek çayê de jî ez dibînim be çiqasî bedî e. Ez baş tedigehîjim ku ev daxwaza wî û nivisandina min ji dilekî pak e. Û ne tene ev, dema ku ez jî ji dile xwe î pak û behenek pe didi

me zanîn ku tişteki weha li dor min, li ber min tuneke, a we çaxe... we çaxe ez dibînim be çawa parî di gewriya vî biraye min î mezin de dimîne, wek zarokeki ku ji gotinen bave xwe bişike peşîye çav le şil dibin û dû re jî av je ten. Ku yekî din bergeheke weha ji min re bi du hezar û du sondan bigota, min e dîsa jî bawer nekira, mîre min. Di we gave de dileki min pe dişewute, dileki min je hers dibe, dileki min jî dibeje ka hûr hûr tekeve ve dînya wî û nas bike, nas bike ka be çi dunyaye-ke seyr e. Ez jî wusa dikim, mîre min. Ez bi gotina dile xwe î dawîn dikim û ve çare bi bergerîn je re dibejim:

- Baş e, keko, ma ez e bikanim çi binivisînim.

Beyî ku keke min li min binere bi nermiken herdu zenden xwe ava çaven xwe paqij dike, ava poze xwe dikişîne jor û di ber xwe de dibeje:

- Tu çi dikanî binivisîne, Darîn. Ez ketime bexte te û Xwede! Tu çi dikî bike, çi dikanî binivisîne, le min destvala neşîne male.

Ez tederdixim ku li ba me, di nava eşîra me de babete nivî sandine ne girîng e, le dîsa jî ez xwe nadime ber ve yeke û dibejime:

26

- Ez nikanim tişteki binivisînim ku.

Biraye min bi wan çaven şil wusa pûç û vala li min dinere, mîna ku ez dîn bûme û loma nikanim binivisînim. Ez van gotinen xwe piçekî diguherînim û dibejime:

- Ez nikanim, nivîsandin jî hunerek e, hewesek e... le ev tiştana li ba min tunene, keko.

- Ma tiştên weha li ba xelke hene, cîma li ba te tunene, Da rîn? Bejna te bi qasî du kesen mala Garût e!

Ez zore didime xwe ku hersa xwe, nerihetiya xwe binixu-
mînim û nedim der, mîre min. Le ez tedigehîjim ku xeta xwar
di lawe mala Garût an jî di lawe mangeyeke de ye. Dixwazim
ji nezîktir binasim û je re dibejim:

- Cîma tu hertim lawe mala Garût didî ber poze min, ka wî
çi kiriye ku min ne kiriye.

Biraye min du tiliyen xwe jî ber bi min bilind dike û dibe
je:

- Du pirtûk nivisandine.

Mîna ku min hay je nîne, ez dibejim:

- Pirtûken çi nivisandine?

- Nizanim, dibeye, tu li vir î û tu baştir dizanî. Wusa digo
tin... digotin, du pirtûken pir heja ne. Digotin ji bo heryekî jî
bejengek pere girtiye. Xelke digot ji wan peran pencsed panon-
ten vir jî daye Keldan î dengbej ku pirtûka wî ya dawîn ji ber
bike. Keldan î dengbej bi minetdarî pe daye zanîn ku jiberki-
rina pirtûke ji bo wî şerefeke mezin e. Keldan î dengbej goti
ye: "Ez e ji ber bikim û bi tevgiredaneke derweşan gund bi
gund bigerim, ez e bigerim û mîna destana Meme Alan bibe
jim." Daye digot ji ber van jîriyen lawe xwe, diya lawe Garût
pir pozbilind bûye. Li ser kaniye poze xwe bilind kiriye û tew
li daye jî ne pirsîye. Daye pir li ber xwe ketiye. Digot je re bi-
27

beje... daye digot ji Darîn re bibeje: Ku ew du pirtûkan neni-
visîne û nede ser hev, ez e jî van herdu guliyen xwe ji binî ve

jekim... digot, ez e jî pore xwe kur bikim û di nava xelke de wusa bigerim. Digot diya lawe Garût ji capûnekê sipê tûrikek çekiriye, bi rîsen rengin neqîşandiye, veçiniye, pirtûka lawe xwe te de bi cê kiriye, weke pirtûka pîrozwer bi dîware oda mevanan ve darda kiriye.

Li vir ez biryara xwe didim, mîre min, biryara xwe didim ku ez jî edî du gotinan ji biraye xwe re bikim.

- Ku ji deste min bihata, dibejim, min e binivisanda. Min e binivisanda û hinekan jî bixwenda. Le wek ku min got, ev ka re ha ji min naye û min dil jî nîne ku ez ji bo xatir û peşine de û meta xwe rabim dest bi nivisandina pirtûkan bikim.

- Ne tene ji bo xatire de û meta xwe, ji bo xwe, ji bo navûdenge xwe bike... bike ku bila xelk behsa te jî, behsa nave te jî bike û em jî pe serbilind bibin.

- Ji bo ku hinek behsa meriv bike, meriv kare nivisandine nakin, keko. Ev yek. Ya duduyan jî, ma serketina karekê weha bi peşine dost û nasiye, bi hükme pere û siparîşa mitribiye na be ku! Ev kare ha jî hüner û heweseke dive, pîvan û daxwazke dive. De îcar ka ew tişt tune ye ku

!

Mîna ku ev gotinen min nekevin sere biraye min, bi enirin herdu desten xwe jî ber bi min vedigire dibeje:

- Pîvanen çi tune ne?

- Ez çi dizanim, dibejim... pîvanen ku ez binivisînim û yek jî bixwîne.

- Ew çi ne?

- Ma ez û tu e çi bikin ku ew çi ne, keko? Pîvanen nivisan dine, pîvanen xwendine ne... pewîstî, hejayî, xwendin û

xwendevan e... û ji bo van hemû tiştan jî bal û hayeke pewîst.
28

De ka bibeje ma kî heye ku van tiştan...

Ev gotinen min dîsa nakevin sere biraye min, dîsa bi enirin bere xwe li heleke çerx dike û dîsa dibeje:

- Çawa kes tunene! Lawe mala Garût gotiye, pirtûka min bûye xyve, bûye wek xweya ku tu bavejî ber bizinan. Herkes... gotiye, herkes le diğerin.

- Ya sitar, dibejim û bi tinaz dipişirim, je dipirsim û dido-
mînim: Ka ne gotiye be ev bizinen wusa bexwe li kudere bû-
ne?

- Bi vî hale xwe tinazen xwe bi xelke meke, Darîn. Qaşo tu jî li vir î. Cima herkes dizane, tu nizanî? Merik... lawe mala Garût ji herkesê re gotiye. Dibejin diya wî jî deri bi deri geri-
yaye, bi peşin û pis behsa lawe xwe kiriye, behs kiriye û goti-
ye: "Ku meriv wî bibîne tera meriv û jiyane dike. Tişte ku ni-
zane tune. Hertîşt, hertişte ve dunyaye li ba wî heye. Ku me-
riv guhdariya wî bike, erd û asiman jî te de mîna ku meriv her-
çar aliye ve dunyaye bîbîne. Meriv pe baqil dibe. Xwediye ru-
hekî dunyayî û yekî asimanî ye..."

A ji te re, mîre min, de îcar te dît be destan çawa li hev ten,
mîtolojî çawa ava dibin, Xwede çawa tene çekirin! Li ser van
gotinen wî, ez bi eş, bi tinaz û bi deve gundiyan dema me ji
biraye xwe dipirsim û dibejime:

- Eee... demax ele.* De ka bibeje be diya wî wekîdin çi go-
tiye?

- Ez çi dizanim, diya wî hîn gelek tiştên din jî gotiye û anu

ha edî herkes jî bi ve yeke dizane... herkes pe dizane û li her deverî jî qala wî dibe. Xelk li bendî pirtûken wî ne. Ji te re di bejim navûdeng daye û ji îro û pe ve lawe mala Garût...

kürden kuji

Demax ele: Demek öyle, bi tirkî ye. Te mana, na xwe wusa.

*

Ew

zimane tirkî dūr in, pirî caran bi vî av/ayî bi lev dikin. (W)

29

Nizanim be cima, mîre min, le piştî van gotinan edî ez na-bejim ev ezîza biraye min î mezin e, ez hürmet û qedre biratiyeke mezin ji bîr dikim, bi herseke vekirî gotinen wî di deve wî de nîvçe dihelim:

- Anuha tu dev ji lawe Garût û mangeyan berde, dibejim, min hay ji van tiştan û rewşa wan heye. Bi kemanî wek xwendevanekî û ji we betir, dibejim, deste xwe jî ber bi van refiken pirtûken kurdî direj dikim û didomînim: Tiştên ku hatine nivisandin ev in... û Xwede dizane ew xweya ku lawe mala Garût jî behs kiriye ev e. De fermo ev xwe û ez û tu jî bizin. Ê ez dîsa ji biraye xwe re bibejim: Min ne nivisandiye, ez nikanim û newerim.

Mîna ku li nava çaven min bixe biraye min deste xwe jî ber bi min li ba dike û dibeje:

- Xelk cima dikanin, xelk cima diwerin?

Ez xwe tûj dikim nabe. Ez xwe nerm dikim nabe. Ez dine rim ku ez çî dikim nabe, mîre min, nakeve sere biraye min ku kare nivisandine ji min naye. Di dawîya dawîn de radibim bi

rewşeke narihet, bi rewşeke westiyayî pe didime zanîn û dibejime:

- Min û xelke nede ber hev, keko, ji bona Xwede bes min û xelke teke qayîşeke. Dema ku ez dibejim, ez newerim, naye we mane ku ez teresek im. Merxasî di kare nivisandine de tune. Ji min naye û dile min naxwaze. Dema ku dil nexwaze û çave meriv ji tişteki nebire... ew e bibe nimûna tajiye, tajiya ku tu bi zore berdî neçire. Meriv bi ser nakevin, te got ere?

- Ere, ere... le wa ye xelk bi ser jî ketine.

- Gelek lawe bavan bi ser ketine... le ji bona Xwede ve ye ke ne ji min re û ne jî ji xwe re bikin sereş. Ev sereşa we na keve sere min.

30

Heta derengî şeve biraye min ji min re behs dike û ez jî pe hers dibim, pe deşim, pe digirîm, pe dikenim û dixwazim tekevime xewe. Le sereşek bi min digire û xew nezîkî min nabe, mîre min. Ji tiştên dûr û nezîkî aqilan sere min giran dibe û ez difikirim. Difikirim û ji nav dernakevim ku de û bave min ci ma sere xwe di ber min û ve nivisandine de eşandine. Ji ber ku tu jî û ez jî, mîre min, em hemû jî pe dizanin ku li ba me dengbejek ji kîmyagerekî betir navûdeng dide, qedir û rûmeta sofiyekî ji peykertiraşekî zedetir e û... û ka te got çî, mîre min? Û di rewş û rastiyeke weha de meriv werin ji yekî mîna min daxwaza pirtûk û nivisandine bikin. Ya sitar û ya sitar, mîre min!

31

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve serpehatiye awuren xwe li portre mîre xwe xweş dike, ji kela dilekî tenik sînge xwe dinepixîne û dibeje:

- Min xwendine, mîre min. Ye me î male jî te de bi zimanen ciye, bi babeten ciye, ji niviskar û penûsen ciye min pirtûk xwendine û min lezeta wan hemûyan guvişandine nava ruh û hundure sere xwe. Bi aheng û harmoniya helbesten wan ez bûme bayekî payizî û bi pelen aven ceman re herikîme, her girangotineke wan di deve min de bûye şekirekî şerabî û ez pe sermest bûme, mîre min. Bi romanen wan re ez derketime zozanen bilind, li bine kon û reşmalan rûniştine û ez li wir bûme bengiye dîlberen koçerî, mîre min. Bi trajediya lehengen çîroken wan min çaven xwe tije av kirine û dilop bi dilop di ser balîven seven nîve şevan de rijandiye, mîre min. Heta ku zik li min hişk bibe ez bi komediyan wan, ji dela xwe û gelek kesen din ve weke ehmeqan keniyame, mîre min. Bi hûkme hûner û afirandina fantaziya wan ez derketime bilindciyan ruhanî, li wir min deste xwe di navik û nermeciyan perîzadeyan asimanî re daye û min av ji xwe berdaye, le anuha... anuha edî dile min ji pirtûkan li hev dikeve û ez dixwazim verişim, mîre min. We şeve ne tene pirtûk û penûsen bi huneren xweş, bawer bike ew hemû pirtûken pîrozwer jî, :ew pirtûken bi gotinen Xwede jî li ber çaven min reş û tarî bûn.

32

Û di tariya çende we şeve de ye ez nizanim, mîre min, le ez denge bave xwe dibihîsim. Denge wî te min ku li yekî hers di be û dibeje:

"- De tu e anuha bibînî!... Tu e bibînî be lawe ke mer e!" Ez dibînim ku ez, bave min, Kamîran î gundiye me û küre wî Zade, em li berware çiyayekî bilind in. Li gel ku em çiyayî ne jî, heta nuha min çiyayekî wusa kûvî bi çaven tazî ne dîtiye, mî re min. Çawa bi lev bikim... ji ber lingen me û berjor, heta ku çaven meriv dibîne, bilind û bilind hildikişe. Meriv dibeje qeye ne ji vî çiyayî be, asiman e hilweşe xware. Di we gave de ez tedigehîjim ku Xwede çiqasî mezin, an jî ez çiqasî piçûk im. Ez nizanim be ji kudere dest pe dike, le bave min û Kamîran î gundiye me dikevîne pesîren hev, yek dibe heft û ye din di beje heyşt. Bave min dibeje küre min û ew jî dibeje ye min. Ji nişka ve ez dibînim ku em li ser zinarekî bilind û bilind in. Di bine ziner de jî asegeheke wusa kwîr, wusa kwîr... Ji xwe newerekiya min û Zade, an jî meraniya bave min û Kamîran î gundiye me e jî di vir de diyar bibûya. Ya rastî ez naxwazim sere te jî beşînim, mîre min, le peyv hatiye ser peyve loma dixwazim ji te re bi lev bikim. Bi kurtî bave min dibeje lawe min mer e û diwere xwe ji ziner de baveje xware, Kamîran î gundiye me jî dizivire ser lawe xwe û dibeje:

"- De ez te bibînim, Zade! Bave xwe rûreş dernexîne!" Le Zade bi hîskîn û bi girî xwe ji ser keviya ziner vedikişîne û bi

33

tirs direve. Ji keviya ziner, ji min, ji bave min û ji bave xwe direve. Bi ve reva wî re ba li tûlika wî dixe û ew pore wî ye zaroktiye li nava hev dikeve. Ew bergeha hîn jî li ber çave min e, mîre min. Heta ku je te deve xwe î piçûk jî ji hev dike û diqîre:

"- Hewar û hewar!..." Denge ve hewara wî li zinaren çiya yen hember olan dide û bi du se dengan dîsa li me vedigere. Ew deng hîn jî di guhen min de diçinge, mîre min. Di we gave de ji nezîkî me şîrqîna tivingeke radibe û pel bi pel belav dibe. Tev dar û keviren çiyayî, ez û bave xwe jî li hawurdora xwe dizivirin û em li ciye şîrqîniya deng diğerin. Dû re em dibînin ku duman ji deve lûla tivinga Kamîran î gundiye me bi lind dibe. Ez dergûşe heftsale di ciye xwe de sipûsar diricifim. We şeve min zaroktiya xwe jî dît û ez dîsa pe jiyam, mîre min. Paşe em ber bi İaşê Zade dibezin. Bi zike xwe î piçûk girtiye û li ser keleke ketiye. Hîn ne miriye, le bimira çetir bû, mîre min. Bi çavekî tirsonek û ruyekî xemgîn mîna ku daxwaza dilovaniyeke bike, deste xwe î bi xwîn û piçûk direjî bave xwe dike:

"- Ez tirsiyam bavo..." dibeje û bedeng, beguneh çaven xwe dide hev. Di we gave de te bidîta be wî bave min çawa li min dineri, mîre min. Ji awur û mirûzen wî, ez tedigehîjim ku ji min re dibeje: "Li gor peymanana min û Kamîran, û li gor berbora çiyayen me, dive tu xwe ji ziner bavejî, an ne..." Ez jî bi ya bave xwe dikim. Li gor peymanana wî û Kamîran î gundiye me, li gor berbora çiyayen me, ez jî bi tirs û şerm ber bi kendale asegehe diçim, lingen xwe ji erde hiltîmm û xwe ji ziner davejim. Le beriya ku ez li erde, li zağa asegehe bikevim... ez ji nava nivînan diveniciqim, mîre min. Ê ez bi xwe dihesim ku ez li vir, a li ve dere di nava lihefen xwe de û biraye min jî li

34

keleka min e. Li saete dinerim, deh kem çare şeve ye. Ew ser-

xewiya ku piçekî di çaven min de maye, ez bi nermiken zenda xwe we jî ji xwe dûrdixim, radibim ser xwe, hedîka di ber nivînen biraye xwe re diçim aliye ve aşxane, deri li ser xwe digirim û li wir bi axîn, bi titûn, bi qahwe dikevime ramanan. Di dawiya dawîn de ez biryara xwe didim û dixwazim li ser gotina bav û biraye xwe, li ser daxwaza mal û eşîra xwe ez jî dest pe bikim û binivisînim, mîre min.

35

Le kaxiz û penûs di dest min de... dikim û nakim ez nikanim, mîre min. We şeve ez nikanim tiştêkî binivisînim, şeva li pey dîsa wele, şevtira din, yeke din û geleyen din, mîre min. Ê di van şevan de biraye min li ber min diğere, bi min de dikeve û xwe daveje bexte min ku ez binivisînim. Ji min daxwaz dike ku bi kemanî di van se heftan de ez ji mala me re nameyeke direj lekim, weke pirtûk bi hev xînim û bi wî re bişînim, bi gotina wî ez wî destvala neşînim. Çi sere te beşînim, mîre min, di van se heften serledana wî de ev mijara nivisandine di navîna min û biraye min de... heşa ji te, dibe gû. Li ser ve yeke serhişkiya me di hev diğere û em ji hev xirabtir dibin. Bi kurtibirî we çaxe biraye min destvala vedigere û bi qasî se mehan piştî we vegera xwe û welet ji min re nameyeke bi re dike. Xwede dizane li wir jî wî dîsa xwe havetiye bextekî û ev nama xwe daye nivisandine.

Darîne Daryo ji ser sandaliya xwe radibe, ber bi refikek pirtûkxana xwe diçe, radiheje dosîyereke, dîsa te li ciye bere rûdine, rûpelen dosîyere li hev diqulibîne û di ber xwe de dibe je:

- Ka raweste, mîre min, ez e anuha ji te re bi deng bixwînim, le bila di navîna min û te de bîmîne. A va ye nama ciwamer li vir e, guhdar bike, dibeje û ji mîre xwe re bi deng dixwîne:

"Biraye min î heja, Darîn, bi xemgînî dibejime te ku xwezî
36

me şanzdeh salen din jî hevdu nedîta û bila ez van rojen îro nejiyama. Dema ku ez ji ba te vegeriyam, te bi xwe jî dît be ez di çî rewşe de bûm." Rewşeke pir xirab bû, mîre min. Lepek ma bû. Te digot qeye meriv giloka dunyaye xistiye tûrekî û ew tura di milen wî de kiriye. Mîna ku bi nexweşiyêke benav bikeve, mîna ku tu heviya wî û jiyane nemîne, helisî bû, hişk û zuwa bû bû, hustuye wî direj û ev herdu milen wî jî daketi bûn jer. Çaven wî di kortalen xwe de çû bûn xware û ji te re sond dixwim, mîre min... sond dixwim ku her kortalek jî mistek xwelî dikete. Ne dûrî rastiye ye ku ez ji te re bibejim di van se heftan de gelek kîlo je kem bû bûn, mîre min. Ne dipeyvî, li min meze ne fikir, dema ku min ew bi re kir, bi min wusa hat ku nizanî bû xatir jî ji min bixwesta. Bi ruhekî vala, bi serêkî vala, bi awuren vala bere xwe da min û di deriye balafirgehe de wenda bû. De ka tu raweste ez ji te re tevayîye nama wî bixwînim, mîre min. Bele... "Ez nikanim we rewşa xwe û we roje bi gotinan vebejim. Le ew şop û birînen ku we hevdîtina me li min hiştine, ew e li dare dunyaye qet ji bîra min ne ce. A bi we rewşe, bi wî ruhî ez hatim male. Peşîye min kir ku ez ve keleka bi rex veşerim. Min xwest ku ez hinek tiştan li hev bînim û rastiye ji kesekî re nebejim... û nemaze ji bavo re.

Le bavo zana bû, tavile ji ve rewşa min derxist û dînya li ber çaven wî reş bû. Piştî ku min rastiya xwe û te je re vekir, ji min jî xirabtir bû û kete nivînan. Heta heyşt rojan beriya nuha jî di nava nivînan de bû. Anuha nivînen wî vala ne. Di ber sekrate de jî weke hemû kesan ji Xwede ne tirsîya, ji mirine ne tirsîya, deste xwe li ber pexemberan venegirt û daxwaza şefaete ji wan ne kir. Weke hemû kesen li ber mirine av ne xwest. Gotinen ku digot ev bûn, digot: 'Ling bidin ser Darîn û je re bibejin... bibejin bila pirtûkeke leke.' Peyven xwe yen dawîn û 37

nîvçe jî ji bo pirtûke bi kar hanî û got: 'Pirtûk, pirtûk... pirt...'
Bele, got pirt û çaven xwe dan hev. Rebena daye jî xwe li hev şaş kiri bû, we jî digot: 'Bazdin mala seyda... bazdin û je re kita miqedes bînin.' Le anuha te jî fam kiriye ku mebesta bavo ne kiteba miqedes bûye. Dile wî pet bû û xuya bû hîn jî heviya wî ji te û lekirina pirtûkeke hebû. Ez naxwazim ev nama min, te xemgîn bike û ji xwe ji bo tiştêkî wusa jî ez ji te re naşînim. Tene min xwest ku ez weke wesiyeta bavo, van gotinen wî yen dawîn bi te ragehînim û te hay je hebe. Xwede te salîh bike û bide ser riya rast.

silaven biratiye tem herdu çaven te.

"Bi

Biraye te Sadûn

Bîst û pençe payiza peşîn

"Not: Daye silavan li te dike û dibeje: weke her dayikeke, weke diya lawe mala Garût... min jî Darmâ xwe bi qasî neh mehan di zike xwe de gerand, min jî dergûşe xwe bi dilovanî

mijand û bi delalî mezin kir. Daye dibeje: şîre min jî weke şî re dayiken xelke sipê bû."

38

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke nama biraye xwe li hev radipeçe û li peş xwe datîne ser mase. Mîna ku anuha nû de û bave wî ev gotinen xwe kirine name û je re şandine, di we gave de eşa dilekî tenik xwe li kirtika poze wî dide der, li gewriya wî belav dibe, bi çaven tije av li portre mîr dinere û dibeje:

- Tu dizanî, mîre min... tu dizanî ez ne merivekî wusa dilpet im. Li ser ve yeke ez gelekî li ber mirina bave xwe ketim. Herçiqas ev xwestina wî li ba min tişteki pûç û vala, daxwazekê dûrî rastiya min bû, le dîsa jî ez pe eşiyam ku min cima bave xwe bi çaven vekirî, bi desten vala şande gorne. Heta demekê jî ez ji bandora mirina bave" xwe û van gotinen wî ne filitîm. Piri caran beyî daxwaza xwe ez diketim ramanan. Min xwe dûr berdida û ez dûr diçûm, mîre min. Di her çaren we ha de min xwe di qunciken şikeften reş û tarî de didît. Min didît ku ez dadidim nînoga ve tiliya xwe ya peşaneke, dikeşim û bi qasî se movikan direj dikim, dîsa bi we tiliya xwe ez quleke di defa sînge xwe de vedikim, nînoga xwe ya direj di xwîna dile xwe de dikim û li ser tişteki tiştina ledikim. Nizanim be min çî ledikir, mîre min. Ez nizanim be min bi kîjan ziman û kîjan elfabe jî dinivisand. Di we gave de tişte ku ez li ser dinivisînim jî ez nizanim be çî ye: ez nizanim be dar e, kevir e, çerm e, kaxiz e. Le min tişteki wusa dinivisand ku... bi min wusa dihat ku heta nuha jî tişteki wusa evda-î alemekî ne

xwendiye û tucarî jî ew e nexwîne. Piştî nivisandine jî min lez dikir, min ew nivîsen xwe li hev berhev dikir û ez diketim ri ya goristane. Hîn jî ez nizanim, mîre min... ez nizanim be ji herdu goristanen me bave min di kîjane de kirine erde, ez nizanim be gorna wî li kîjan aliyê dikeve û bi çend keviran bi lînd kirine, ez bi we jî nizanim. Le ez diçûm ser gorna bave xwe, min kela ber sere wî bilind dikir, min ew nivîsa xwe dadihanî ber sere wî û min bi se dangan banî wî dikir, mîre min... min banî wî dikir û digote:

"- Bave min î maqûl, bave min î delal, bave min î dilovan!... ji bo wan gotinen te, ji bo we hevî û we daxwaza te va ye ez bi behna tariye re hatim ba te. De ka tu sere xwe rake, rabe li peşberî min rûne û ruye min bibîne... ruye min bibîne be ez di çî rewşe de me, bavo." Min li bave xwe dineri wekî xwe î bere ye: bi kincen bere ye, bi şekalen bere ye, bi koloz û simbela bere ye, bi salen bere ye. Ê ya sitar, mîre min!

"- Ez hîn li vir im," digot, "ez hîn bi re ne ketime, ez li ben dî te û pirtûka te me." Di we gave de bi van gotinen bave xwe re ez jî wir bi qasî se hezar û pencsed salen beriya îro dîr diçim û li wir ez xwe di nava xelkekî we deme de dibînim. Di bînim ku xeten nivise di nava wan de jî pir pîroz e. Ew kesen li ber mirine teşt û beroşen xwe derdixine firotane, rez û pezen xwe hûr dikin û dikine zer, jin û keçen xwe davejine mezatan, peşkeşî aliman dikin, xwe davejine bexten wan û wan bertîl dikin ku ew ji wan re çend rezan lebikin. Ez dibînim alimen nivismend li ber dîware goristaneke rûniştine, li ber her

yekî jî gurzeke penûsen zîlîn, girozen papîrus û çermen gameşan li ser hev in. Çawa bibejim, mîre min, rasterast weke van arzûhalciyen dema me ne. Li peşberî wan jî meriv ketine reze û tiştina didine nivisandine: ji diya xwe re, ji kale xwe re, ji 40

xwe re... De îcar bi tirs û streseke çawa, bi hevî û daxwazeke çawa, mîre min! Ji wan mişteriyên yek gelekî bala min dikişî ne, ne mişterî bi xwe le keça li ba wî, a ew pir bala min dikişîne. Ez nizanim be keça wî ye an destirmana wî. Le ez baş pe dizanim ku... ji bo ku tiştêkî bide nivisandine merik ew keçika bi xwe re haniye û peşkeşî nivismendekî dike. Keçik jî... çawa bibejim, mîre min... berzewaceke li ber kewna xwe ye. Xeftanekî mîna çerm li navmilen we ye. Laşe di bine xeftan de ez nabînim le ruye we gelekî lihevhatî ye. Alim î nivismend ji ciye xwe radibe, wî xeftanî ji nav milên we dide alî û keçik şilf tazî li peş wî ye. Ne tene li peş wî, li peş herkesi ye, mîre min... herkes dibîne û bi min wusa te ku herkes jî dikane bibîne. Ê ez jî dibînim. Ez dibînim ku du pesîren nîvgilover li ser sîng û gerdeneke genimî wek du felqên hinaran hişk dixuyin. Li jera wan jî navikek'... û li jera we navika gunehkar jî pirçeke firk; pirçeke heram nû girtiye dora ranên we. Hedî hedî li dor keçike difitile... ew î alim hedî hedî li dor îlaşe keçike difitile, ji jer û jor ve li bejnûbala we dinere, bi zimanekî tiştina je re dibeje, bi du tiliyan deve we ji hev dike, li hundure çaven we meze dike, deste xwe di ser pirça berzika we re dibe û tîne, kulemeka we saxî dike û ditepîne, paşe jî deste xwe li pesîren keçike dipelîne û di mista xwe de diguvişîne. Peşiye bi mana ere

sere xwe dihejîne, dû re li ber çermekî gameşan rûdine û tiş tina ledike. Heta ku ew î alim vî kare xwe diqedîne, ez jî bi mereq temaşa ve rewşe dikim. Ew mişteriye ku edî tu jî pe di zanî, a ew jî wî çerme nivisandî dide bincenge xwe, tev wî îa şe ter û ciwan keçike li wir dihele û bi gaven bextiyar, bi gaven ewle, bi gaven beşerm ji ber dîware goristane dûrdikeve. Ez dibînim ku ew tirs û stresa bi qasekî bere bi merik re ne maye. Mereqdarî li min zedetir dibe û ez bi pey merik dike-
41

vim. Ez dixwazim bixwînim û bizanim ka çi hatiye nivisandin, mîre min. Ez dixwazim bibînim ka çawa hatiye nivisandin. Le merik sere xwe li ba dike û ez wusa tedigehîjim ku meriven ve dunyaye nikanin bixwînin. Xwe bi xwe, ew ji bo wan ruhen dînya aliye din e, dibejim. Ê wek ku min got, mîre min, a ji we roje û pe ve ev bergeh, ev raman car bi car li min bû mevan û hîn jî em ji hev ne dûr in. Ez nizanim ka be bave min hîn jî li bendî min û pirtûkeke ye an ne, le min ne xwest diya min jî bi hesreteke weha biçe û gotinen weke wan gotinen ba ve min li pey xwe bihele, mîre min. Min ne xwest diya min şî re xwe li min heram bike û biçe, loma... loma piştî ve name, piştî van xeberen naxoş û piştî van hemû tiştên ku min ji te re gotin, edî min jî biryara xwe da, mîre min. Anuha tu jî bi kerem dizanî ku... li vir ev dibe cara duduyan ku ez biryareke wele didim. Bele, min biryara xwe da ku ez jî ji diya xwe re pirtûkek weke wan pirtûkan, pirtûkek mirine* binivisînim, mîre min.

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke dest daveje dare qe-

lûne, se tilî titûna nû didewusîne serika we, agir pe dixê, tev gepeke duman we jî ber bi portre Ahmede Xanî radike û didomîne:

- Dîsa gotinhatiye ser gotine, mîre min... sesed sal, bi qasî sesed û çend salan beriya nuha dibêje: "Da xelk nebejtin ku: ekrad be marifet in, be esi û binyad; enwaî milel xwedankiteb in, kurmanc tene di be hesab in." û ez jî... ji mîre xwe re bibe-

* Pirtûka mirine: Dibêjin hezar û pencsed sal beriya Mesîh, li rojhilata navîn

aliye din î jiyane

baweriyeke wusa li ba merivan hebûye ku piştî mirine,

li

pirsanji merivan dikan. Ji bo ku meriv bi silametî derbas bibin û ji pirsin dij-

war bijilit in, pewîstî bi çend xeten nivisandî hebûye ku meriv li wir weke pa-

saporteke îroyîn bi kar bînin. Ev jî bi naven tekst anjî pirtûken mirine bi nav

bûne. (W)

42

jim, anuha edî cenabe te jî bi kerem tederxist be min ji bo çî xwest ez dest pe bikim û binivisînim. Le beriya ku ez. dest pe bikim, min xwest ez rewşa lîteratura zimane male ji nezîktir, pir ji nezîktir ve bibînim, mîre min. Ji ber ve yeke jî ez betir ketim nav pirtûkan, ez ketim nav pirtûk û niviskaren wan. Û ev dibe se sal ku ez bi wan re diğêrim, bi wan re radibim, bi wan re rûdinim û ez guhdariya wan dikim. Heta vî dane sibe

jî ez di nava wan de bûm, mîre min.

43

Mîna ku anuha gotinen Darîne Daryo, gotinen Darîn î lehen ge ve çîroke biqedin û tiştên ku ew ji mîre xwe re bibeje nemîne, bi qasî du hilmen qelûne bedengiyek çedibe, dû re awuren wî li kîse dermanen ser mase ase dibin û bi dengêkî nizm:

- Nabe, mîre min, nabe... dibeje, deve kîs le vedike, yek bi yek wan dermanen te de derdixe, le dinere, nivîsen li ser bi deng dixwîne û dîsa datîne ciye bere. Dema ku paketa dawîn derdixe, li portre mîr dinere, kesereke vedide, pakete jî ber bi wî bilind dike û didomîne:

- Antî depressiv. ilme te fere ye, tegehîştî ne wusa, mîre min... a îro jî... te dît ku ez bi gavekî bere hatim, min ji te re got ku heta vî dane sibe jî ez di nava wan de bûm, dibeje, we pakete jî di kîse vekirî de datîne ber wan dermanen din, bi keservedan xwe bi palgiya sandaliya xwe ve dizeliqîne û dibeje:

- Ye min jî... va ye edî tu bi xwe jî dibînî be çawa ye, mîre min. Ez li nexweşxane bûm, ez dibejim nexweşxane le tu bi beje tîmarxane. îro... vî dane sibe li ser edebiyate komcivîneke entellektuelan hebû. Ji xwe çî bû di we komcivîne de bû, mîre min. De îcar te bidîta û te bibîhisiya, mîre min, ma çî ne digotin ku!

Li vir destekî xwe li ba dike, ji sandaliye radibe ser xwe, ber bi aşxane diçe û di ber xwe de bi pilepil dibeje:

- Bi destura te, mîre min, ez hinek av bînim... ez hinek av

44

bînim û ji mîre xwe re bibejim. Tiştên seyr in!

Diçe piyaleke av tîne, datîne ser mase, li ser lingan ji wan paketan yekê vedike, du heban je derdixe û di ber re jê her dipeyive û ji mîre xwe re dibeje:

- Ya rastî doktor ev tiştên ha li min qedexe kirine. Ji min re got:

"- Ji mijar û ramanen weha dûrkeve û heta ku ji te te li ser van tiştan nekeve heftûheyşte." Ji xwe ez jê ne merivekê wusa me ku bi hinekan re tekevim heftûheyšta van tiştan. Ez diza nim, mîre min... ez baş jê dizanim ku tiştên wusa pere nake. Li ser lingan wan heban dide ser zimane xwe, ji nîve ava we piyala ser mase deve xwe tije dike, di gewriya xwe de berdide, bi tiliyan deve xwe paqij dike, wek wan qumarçiyên ku bi hers qeremaçên xwe li erde didin, ew jê bine piyala xwe li mase di de, wan gotinên xwe yê jorîn dubare dike:

- Pere nake, mîre min, dibeje û rûdine. Piştî bedengiya çend hilman deste xwe li ser wan name û kovaren ser mase di gîrîne, radiheje çendekan û le dinere, beyî ku veke dîsa datîne û dîsa berepaş xwe bi palgiya sandaliya xwe ve dişidîne. Mîna ku anuha edî piçekî rihet kiriye, bi pişirin li portre mîr dinere û dibeje:

- De îcar min ji te re çîroka vî dane sibe ne got, mîre min. Ji semînerdaren komcivîne, peşiyê yek rabû... yekê çawa bibe jim... ez nas nakim, ji nezîk ve nas nakim, le ewqas tişt li ser vî ciwamerî hatine gotin ku edî herkes pe dizane. Herkes pe dizane û dibejin xwediye navûdengekê qelew e... dibejin ji na ve Xwede betir ji vî nave xwe hez dike. Xer û guneh li hustu-

ye wan be, le dibejin ku tu bi qasî behna cixareke li ba wî rû-
nî, tu e baş bibînî ku rasterast nexweşe nav û mezinbûna xwe
ye. Ez newerim bibejim, mîre min, le ez bawer im rastiya van
45

gotinan jî-heye. Bi min jî wusa hat. Merik rabû û yekser weke
bûkan behsa xwe kir û got:

"- Edebiyata me... binerin dema ez ji bo konferanseke li
Helsîngforse bûm, ji min pirs kirin ka edebiyata me di çi rew
şe de ye. Ew tiştên ku min li wir ji wan re gotin, ez dixwazim
anuha li vir ji we re jî bibejim. Edebiyata me di erdekî hişk de
kulîlk e, giya ye, nîsk e, nok e û je re av dive. Pewîstî bi avda
ne heye. A ez jî... heta ku ji min te ez jî van nokan avdidim.
Bare min giran e. Kare min giran e. Pir dijwar e. Ez bi tene me.
Ez dizanim. Le dîsa jî bi her awayî, bi her celebî, bi her re û
metode, bi şev û bi roj ez ave dikeşim ser vî erde hişk ku ew
noken ter û şîn hişk nebin..." Bi van gotinen wî re ji guhdaran
yek rabû û... Xwede dizane ji deste bû, mîre min, rabû û göte:
"- Ya maqûl, meriv nokan avnadin ku..." Nizanim cima, mî
re min, le li ser van gotinen ew î deştî semînerdar kurt le ve-
gerand û bi enirin göte:

"- Tu nokan avnadî, le ez avdidim!" Ew î deştî dîsa pe da
zanîn û göte:

" Ne ku ez avnadim, ezbenî. Min ne got, ez avnadim. Min
got, nok nayene avdane!" Semînerdar betir tengijî, deste xwe
jî li ba kir û göte:

"- Tu fam nakî. Wek ku min got, dema ku min ev gotinen
xwe di konferansa de gotin, pencsed kesan ji min re li çepikan

xistin, hezar dest li hev ketin û ji bo van gotinen min deng derxistin. O anuha ev deng li her devere belav bûye. Le tu... tu tenagehîjî." Ew î deştî dîsa danexwar, mîre min, gotinen xwe dubare kirin û dîsa göte:

"- Ke ji te re dest û lingen xwe li hev xistine ew tişteki din e. Ez dibejim nok nayan avdane û cima nayan avdane ez ji te re bibejim: Dema ku nok bi qasî bihusteke bilind dibe û baçil 46

pe dikeve, bi gotina te, ter û şîn dibe... bi zimane me gundiyan şoraviyek digire ser. Tişte ku nokan dikin nok jî ev şoraviya wan e, te got ere? O ku tu rabî nokan avbidî, tu e bişewutînî, te dîsa got ere? De îcar tu rabûyî ji me re behsa desten hêlsîngforsiyên dikî... ma ew çî dizanin be nok çî ne! Ew hej nizanin ka be nok bi dar an bi giyan ve ten..." Semînerdar ve çare deste xwe jî ber bi ew î deştî direj kir û göte:

"-. Tu jî hîn nizanî be ez behsa çî dikim. Li vir ez bi zimane-kî edebî dipeyivim. Ez dixwazim behsa edebiyateke bikim... ne gundî û noken wan!" Li ser van gotinen wî, ew î deştî ra bû ser ligan û göte:

"- Anuha tu behsa çî dikî bike, le ez dibejim dema ku tu nimûnen xwe didî, bila ne ji dunyaye der be, bila ne dûrî aqilan be. Bibeje, edebiyata me kundir e û ez jî avdidim. We çaxe... a we çaxe gotinen te e ciye xwe bigirin." Semînerdar enirîna xwe kir hers, hersa xwe bilind kir, denge xwe bilind kir, dest xwe bilind kir û dîsa ji ew î deştî re got:

"- Tu nuha dev ji kundure xwe berde, tu fam nakî. Binere, ez hunermendek im. Ez niviskar im. Ez edebiyat û zimane-kî

çedikim, zimanekî nû... ji vî zimanî re bi fransî dibejin: une langue nouvelle. îro di gelek kovar û rojnaman de li ser vî zimanê min, li ser kiteben min, li ser niviskariya min, li ser hûner û jîriya vî tiştî dinivisînîn û ji min pirs dikin ka cima ez li ser gundiyan nanivisînim. Ez li ser maqûlen wusa dinivisînim ku... ez dibejim dema lehenge min bimire bila xwendevan li pey bigirî. Ez naxwazim xwendevane min li pey lehenge min bibeje: 'De gundiyekek bû û mir bila bimire!' Ez van tiştan bi zanîna dikim. Ev zanîna min jî berhema niviskariyê bîst û penc salan e. Ez lehengen xwe hildibijerim. Ez gotinen xwe hildibijerim. Ez hevoken xwe hildibijerim. Ev hunerek e. Noken ku

47

ez behs dikim, noken nû ne, noken edebî ne. Biçe le bigere û bi xwe bibîne be çawa behsa meziniya ve hunera min dikin. Ma ez e rabim piştî van hemû tiştan ji te hîn bibim ka ez e çi bibejim ku gotinen min ciye xwe bigirin! Şerm e! Ez ne gundî me. Tu gundî yî, we çaxe tu jî biçe kare xwe bike!" Gundî jî kare xwe kir, mîre min. Bi hers rabû penûsa di destê xwe de şikand, dîsa bi we herse li erde xist, ji salona komcivîne derket û careke din jî venegeriya hundur. Dû re ji min re gotin ku ev herdu serî hevdu baş nas dikin. Dibejin ev ne cara peşîn bû ye ku ev herdu zaten ha ketine pesîren hev. Careke din jî wusa bûye. Dîsa tiştêkî wek ve noka beyom di navîna wan de bû ye sedem ku rabin hev. Dibejin we çaxe jî dîsa ev deştiye ha ji ciye xwe rabûye û li ruyê wî gotiye:

"- Tu gotinen pûç û vala li ber hev rez dikî! Mîna ku ev jî marîfeteke mezin be, tu dixwazî meriv ji bo van gotinen te li

çepikan bixin... le ez newerim tişteki weha bikim. Ku meriv bi çewtî ji te re bibeje: dirûven Homerosekî bi te dikeve, ji bo ku xwe bişibînê Homeros tu e rabî rahejî kevçî û çaven xwe derxînê... tu dixwazî renege xelîfekî edebiyate bidî xwe û xutban li ser nave xwe bidî xwendine. Mîna ku hûkme literatûre di dest te de be, tu ji xwe re li pey koloniyen edebiyate diğeri û hew." Xwede dizane be cima, le merik rabûye ji vî semînerdarî re gotiye: "Tu mytomanekî mezin î!" rasterast gotiye, "tu na ne bexwe dixwî, tiren şor dikî." De îcar em ji çîroke... em ji komcivîna ve sibe dûrketin, mîre min. Piştî ku ew î deştî derket û çû... semînerdare hêlîngforsiyen, bi gotina ew î deştî, vî mytomane mezin behsa hinek tiştên din jî kir. Bi zimane xwe î nû, bi gotina wî, bi une langue nouvelle behsa edebiyata me kir, behs kir û got:

"- Dar hildikişe. Dar qalind dibe. Dar bilind dibe. Dar me-
48

zin dibe û dibe darek siltanî." De îcar Xwede dizane be wî dixwest bi van gotinen xwe çî bibeje. Le ku ez li xwe mikûr werim û bibejim, min tişteki ji ve dara wî dernexist, mîre min. Ya rastî min xwest ez rabim ve tenegehîştina xwe pe bidime za nîn û bibejim: Bi van daran tu dixwazî çî bibejî, le ez ranebûm û min ne göte. Min nexwest ez jî bibim deştiyekî duduyan, mîre min. Ê piştî van heftûheyştan dor hate yekî din. Şaîrekî kevin bû, mîre min. Nizanim cima, le bi herseke mezin bû. Dema ku dipeyvî kef bi deve wî diket û... digot:

"- Hûn behsa çî dikin bikin... hûn çî dibejin bibejin. Le lezet di helbesten we û îro de tune. Weke wan firingiyen ku

meriv di kaye de sor bikin, helbest li vir çenabin. Li van deran..." digot, "mijar tuneke ku meriv li ser binivisîne. Ez helbesten we dixwînîm, dinerim ku li ser eş û xaça îsa ne, li ser şiv û fermanen Musa ne. De îcar werin li welet binerin. Sikir ji Xwede re bi sedan îsa û Musa derketine. Ku em bixwazin em dikanin Xwedayan jî çebikin. Îro li dunyaye, li ba me bi sedan gund dişewutin, bi hezaran meriv tene kuştin, bi mîlyonan meriv koç dikan. Dive meriv van mijaran bibînin, berhev bikin û binivisînin." Min xwest ku ez rabim û je re bibejim: Ya seyda, edebiyat afirandin e, edebiyat naye berhevkerin, le min ne got, mîre min. Min ne xwest ez jî tekevim heftûheştêke. Le ji guhdaran yek rabû... ciwamerek rabû û göte wî:

"- Heyfa wan bajar û gundan e ku ji bo helbestêke xweş dişewutin." Li ser van gotinen guhder, şaîre kevin jî hersa xwe mezin kir, av û kef bi deve xwe xist, tiliya xwe jî li wî ciwamerî bilind kir û göte:

"- Binere, Melaye Cizîrî bûyeren xelke xwe, li ser tahten welate xwe dinivisand û weke helbest dîsa li ser wan tahtan dixwend. Dema ku xwendina helbesten xwe diqedand û radi-

bû diçû, ew tahten ha ji hûkme helbest û xwendina wî mîna seleke disincirîn û jin û bûkan jî diçûn hevîre xwe pe ve didan. Le tu tenagehîjî ku!" Li vir jî herdu seriyan ji hev gazin dikirin, mîre min, gazin dikirin ku ye hember tenagehîje. Dû re ji semînerdaran yekî xort rabû ser kursiye. Yekî çawa bibe jim, Xwedeyo... yekî wusa ku naye gotine, mîre min. Cil û bergen li ser wî ne tiştên şaîran bûn. Cotek potînen becir di

lingan de, parkekî ji van rengen leşgerî li navmilen wî bû, ya sitar! Bi zincîr, bi xelek, bi berîk û bi gelek tiştên seyr bû. Meriv digot qeye nû ji leşgeriye reviyaye. Şela şaîran pe ne diket. Rabû weke gameşe ku bîna ave bike hustuye xwe direj kir, se re xwe rakir, awuren xwe li jor li dereke zike salone ase kir, çaven xwe dan hev û dest pe kir. Bi min wusa hat ku... ne te ne bi min, ez bawer im ku hespan jî ev rewşa wî bidîta û guhdariya wî bikira, ew e bigota ev maqûle ha ji aqil û kîsen hinekan dipeyive. Bele, peşîye nave gelek çem û çîyan, nave gund û bajaran, nave dest û çolan bi lev kir û da zanîn ku wî ji wan deverina ji me re silaven germ û agirî hanîne. Dû re li gotara xwe zede kir û da zanîn ku dive meriv ji bo tiştên mezin kar bikin, dive penûsen niviskaren me mezin bin ku pe roman û dîwanen mezin werine nivisîn, bi penûs û seren piçûk çîroken kurt jî nayene nivisandine, dive meriv zimane xwe mezin û fe re bikin... digot:

"- Ke gotiye ku zimane me ter nake û naşerîn e! Zimane me zimanekî wusa ye ku dema meriv guhdarî dike, meriv dixwaze bajo ser koziken dijmin!..." Li vir jî min xwest ku ez rabim û bibejime: We çaxe ew hemû teresbaven ku li ve dunyaye najon ser koziken dijminen xwe, dive peşîye zimane me hîn bi bin. Zimane me hîn bibin ku biwerin bajon ser kozikan... Le dîsa min denge xwe ne kir, mîre min. De îcar ciwamer ev go-
50

tinen xwe jî bi tirkî digot... digot û didomand:

"- Geniş düşünmeliyiz, büyük düşünmeliyiz, large düşünmeliyizki ölümsüz eserler yaratalım. Bunun da tek yolu ordu-

laşmadan geçer: yazarlar ordusu, sanat alayaları, kültür tabur
ları yaratmak gerek. Kalemimiz silah, silahımız kalem ol
sun!"* Ez nizamim, mîre min, le piştî axaftina van ciwameran
baweriyek wele li min peyda bû ku... Ez dibejim, ku meriv
bixwaze yekî bixapîne dive meriv bi tirkî bipeyive û ku meriv
bixwaze xwe bixapîne dive meriv bi kurdî bipeyive, te got çî?
Li vir jî min kir ku ez rabim û je re bibejim: Ya maqûl, şerîni-
ya vî zimane me î serîn cima tu bi zimane me î serîn nabejî...
cima edebiyateke wusa eskerî û bi unîform! Le weke hertim
min ev gotinen xwe jî di hundure xwe de nixumand û ne gö
te wî. A we çaxe... ji xwe çî bû a we çaxe bû, mîre min. Di we
gave de min generalen helbestan dîtî, min kapîtanen novel û
romanen dîtî, min çawîş û onbaşiyen nivisen bi babeten ciye
dîtî... bi kurtî hemû qumandaren literatüre bi meşeke leşke-
rî di ber min re derbas bûn. Ji ve bergehe ken û girî di hundu
re min de li hev ket, keliya, kef da û di kaniyen çaven min de
dan der. Bere çaven min reş bûn, dile min li hev ket û wekî din
jî... wekî din jî tişteke naye bîra min, mîre min. Min çaven xwe
li nexweşxane vekir.

jireh bifikirin, dive em mezin bifikirin, dive em large

* Kurdiya we: Dive em

bijikirin ku em berhemên nemir biafirînin. Ev ji tene bi riyeke dibe, bi riya
avakirina ordiyeke: Dive em ordiya niviskaran, alayiyen hunermendan,
taburen

kültüre ava bikin. Bila penûsa me bibe sîleh û sîleha mejî bibe penûs! (W)
51

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke bi qasî çend hilman

sere xwe dixe ber xwe, mîna ku anuha bi raman li tiştêkî ase bibe, bi awuren vikûvala li kêse dermanen xwe dinere, dû re bi nîvşerm û nîvxemgînî vedigere ser portre mîr, bi herdu destan serçave xwe mist dide û bi rewşeke bexew dibeje:

- Doktor hat paş sere min, mîre min, li paş sere min nav û paşnave min pirsî...

Mîna ku hay ji çewtiyeke xwe bibe, li vir bi tevgereke beçare herdu desten xwe jî ber bi portre mîre xwe vedigire û dibeje:

- Tu bi xwe jî dibînî, mîre min, tu dibînî ku hiş di sere min de ne maye. Min ji bîr kir ku xwe bi te bidime naskirine. Gerçi ne girîng e, le weke edet... ez dibejim edet le tu bibeje weke nexweşî. Bele, tiştêkî wusa jî denristine ku dive meriv çelî xwe bikin. Ne tene çelî xwe, di roja îroyîn de radibin behsa gelek tiştên din jî dikin. Behsa tiştên wusa dikin û tiştên wusa dibejin ku anuha ez şerm dikim ji te re bi lev bikim, mîre min. Ji nişka ve û bi hers radibe, ji ser masa nivisandine radiheje pirtûkeke,* dîsa bi we herse li ser lingan rûpelan le diqulibîne, bi dengekî nizm ji dereke we tiştina dixwîne, dû re li mîre xwe vedigere û dibeje:

- Li gor gotinen merik... merik behsa jiyana xwe dike, mî-

Pirtûk: Computera Ber Dile Min, Mahmûd Lewendî, ji feurtenivisen yen

*

wî

mizahî pek hatiye. (W)

52

re min, xer û guneh li hustuye wî le li gor gotinen wî: hîn di piçûktiya xwe de xwediye kultureke kevnare bûye, bala wî li ser şexsiyeten mezin bûye, çaven wî hertim li ciyen bilind bûye. Ev tiştên ha jî di peçekiya wî de de û pîrika wî, bav û kalike wî... her yekî ji alîkî ve di guhen wî de gotine û ew kultura me ya bi qasî penc hezar salan kevin kurisandine hundure serî wî. Li Diyarbekire ew taxa ku di wexteke de mala Cemîl Paşaye bapîre Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa le bûye, anuha mala wan jî li wir, li we taxe bûye. De îcar di şeş saliya xwe de dest bi niviskariye kiriye. Berhemên wî yen çapnebûyî gelek bûne... li gor ku merik dibeje, ji dusedî zedetir berhemên wî hene û hemû jî anuha di sere wî de ne, mîre min.

Pirtûke daveje ciye bere, rûdine, radiheje qelûna xwe pe dilîze, dikeşe û dibeje:

- De îcar em veşerî ser pîrsa xwe û ez ji mîre xwe re bi kurtî bibejim: Ez ne xwediye jiyaneke wusa rengîn im. Nave min Darîn e... Darîne Daryo dibejine min. Ez ji gawestiyên malen Cemaldînen serhedî me û anuha ji wan deverina dûr ez jî li vir dijîm. Vir, dibejim... nizanim be te ji serma we denrist an ne, mîre min, pîr sar e. Le dîsa jî... yekî ku di çele zivistanê de jî ji ba me were vir, ji te re sond dixwim beriya ku bi bapêş bikeve ew e bi bayê ve niviskariye bikeve. Çiqas ji ve rengdere hez dikin! Ku meriv ewqasî ji Xwede hez bikira, meriv e ji buhuştê ciyê herî xweş bi dest xwe bixista. Ne ku ez ti liya xwe di çavê xwe re dikim û dibejim bila ji nava me dernekevin, le streseke nivisandine bûye nexweşiyêke tegehrîn û li van deran digere, mîre min. Li van deran baweriyêke wusa şîrîn bûye ku dive meriv pirtûkêke binivisîne... mîna ku yek pirtû

keke nenivisîne ew ehmeq e, mîre min. De îcar mîna ku ji van pirtûkan (deste xwe ber bi dolabeke bine refiken pirtûkxana

53

xwe direj dike) yek ter nake, merik radibe ya duduyan jî dini-
visîne. Wusa dike ku meriv jî je re bibeje, a îcar jî tu bûy yekî
ehmeqtir. Ê ne dûrî aqilan e ku ez ji mîre xwe re bibejim di
van çend salan de ji hemû şaxen literatûre me pirtûk hene û
zedetir jî. Zedetir dibejim... bi gotineke din ji ve hingema ha
şaxen seyr, tiştên ewqas seyr û nû derketine ku ez ne bawer im
îro li ba îngilîzan jî navekî je re peyda bikin. Na, ne gengaz e
ku ev şaxen wusa di zimanekî din de hebin, mîre min.

Bi van gotinen xwe re dîsa radibe ser xwe, deste xwe ber bi
refiken pirtûkxana xwe direj dike û:

- Binere, mîre min... de îcar ne tene evqas in jî, wek ku min
got li vir jî hene, dibeje, diçe deste xwe daveje kersega dolabe-
ke bine refiken pirtûkxane û bi kenekî manedar didomîne: Ev
yen ha... ya rastî min dixwest ez wan bişewutînim. Le dû re
min nehirî ku bi şewatS nabe, mîre min... min got ew e rûme-
ta van û wan hemû pirtûken ku di wexta xwe de bi şerefmen-
dî şewutînin tevlihev bibe. Min ne xwest mikro û makro li nav
hev bikeve, min ne xwest çê û xirab tekeve nav hev. Loma min
ev yeka ha ne kir, mîre min. Min ew agir ne kirin. Min got ew
e rojêke teresbavek rabe nave min û Amr ibn al-As* tevlihev
bike. Ji ber ve yeke ye, mîre min, a ji ber ve yeke ye ku min
ew havetine paş ve kilîte. Anuha tu e mereq bikî û bibejî ka
gunehkariya van pirtûkan çî ye?

Ber bi masa xwe diçe, ji çavikeke kilîteke digire, li kersege

tîne, dolabe vedike, pirtûkeke je derdixe, ber bi portre mîr nezîk bilind dike, du se caran dihejîne, mîna şanogerekî hedî he dî li rasta ode diğere û dibeje:

* Amr ibn al-As: Bi destura xelîft we deme Amr ibn al-As di sala 642 an de davije

ser Aleksandriyaye û li gor ku te gotine zedeyî nîv milyon girozen pirtûkan dide

şewutandin. O dibejin van girozen papîrus û çerman ter kiriye ku bi qasî şeş

mehan pe ava çar hezar hemamen bajer germ bikin. (W)

54

- Ku jinek ne bi dile meriv be, meriv dikane çaven xwe bigire û dîsa jî wî kari bike. Le... le ku pirtûkek ne bi dile meriv be, meriv nikane çaven xwe bigire û bixwîne. Û dibe ku mezintirîn hustuxwariya pirtûkeke jî ev be... te got çî, mîre min, dibeje, we pirtûke daveje ser masa rasta ode, ji dolaba paş kersege yeke din derdixe, bi mirûzekî tirş li peş û paşe we dine re, li kefa deste xwe dide, her bi we hunera şanogerekî di ode de diçe û te, ji nişka ve li portre mîr dizivire û dibeje:

- Ku ji niviskarekî re zarokê cebe û ew zarok seqet be, beyî dest û pe, beyî poz û goh be... niviskar e riyekê bibîne, ew e kemasiya zarok baveje ser Xwedayekî û ji nav derkeve. Le ku di pirtûkek wî de seqetiyek hebe... a we çaxe dive hinekî li ser bihizire. Te got çî, mîre min?

Li vir yeke din ji paş kilîte derdixe, leven xwe bi hev ve dişidîne, bi hers û behevî daveje ser mase dîsa li mîre xwe dine re û dîsa dibeje:

- Heta nuha pewîstiya min ji Xwede ne bûye ku ez destê xwe li ber vegirem, mîre min, le anuha ez destê xwe li ber wî jî vedigirem û dibem: Xwede, heta mirineke bi destê te bila ha ya ev yen ha ji hunera xwe nebin, lewra we roj a ku wan hay je bibin, we çaxê ne bi destê te, ew e xwe bi destên xwe bikujin û tekevin ber xwîna xwe!

Piştî çend tiştên weha bi hers dadide wan pirtûken li ser masa rasta ode, li ber dolaba bine refikan çog dide erde, bi hers daveje ciyê bere û dîsa bi hers kilîte li dere dolabe dixîne. Di rabûna xwe de destê xwe jî ber bi we kersege rep dike û dibêje:

- Ya rastî diviya bû meriv xwediyên wan bavetana paş deriyên û ji wan re bigota... Na, mîre min, ez gotina xwe nabêjim. Ez newerim bibêjim. Ma tu e ji ke re bibêjê ku! Ku tu ji yekî

55

re tiştêkî bibêjê, ew e tev hers û enirîna xwe tiştêkî din jî li te vegeirîne û ew e ji te sil bibe. Ew e di newrozan de jî di ber te re derbas bibe û silavan li te neke, mîre min.

Ez şerm dikim, mîre min, ez şerm dikim ku ez di dem û dunyayêke weha de dijîm. Dibêjin li dunyayê tene du tişt he ne ku meriv pe dikevin rewşên teng û naxoş: yek jin û yek jî zimane meriv. Le anuha ez tiştêkî din jî le zede dikim û dibêjim, bepîvaniya kare nivisandine jî. Le eva sisiyan... Di wexta xwe de ûris nîve dunyayê bûne û ji wî nîve dunyayê Trdeyakovskiyek* tene derketiye, le diyar e ku wusa bidome ji van Trdeyakovskiyan em e gelek derxin. De îcar tîpen wusa... tîpen ku tiştêkî ji hev dernaxin, tîpen ku diya xwe di fîstanekî

din de bibinin nas nakin... tîpen ku meriv di ber de beşin, di ber de bişewutin, di ber de şerm bikin ne yek û ne dudu ne, mîre min. Dema ku ez li ser van hemû tiştan dikevim ramanan û le hûr dibim, a wusa... dile min li hev dikeve û ez dixwazim verişim. Xwezila min bi wan deman, wan demen ku ez ji van tiştan dûr. Ê hîn gelek tişt hene, mîre min, gelek gotinên min hene ku ez ji te re bibejim. Le wek ku min got, ez naxwazim sere te jê pe beşnim, mîre min, ez naxwazim behna te pe deng bikim û... Ê doktor ji min re got behna xwe teng meke, got tu çawa rihet dikê wusa bike.

Diçe ji dereke radiheje perdeyeke reş, bi aliyekê pirtûkxana xwe ve dike, dixwaze bikeşe peşiya tevayiya we Ê di ber re jê bi pilepil dibeje:

- Ez e jê edî nekim ku tişteki binivisînim, mîre min. Bila diya min li min bibore. Min destê xwe ji şîre diya xwe şuştîye.

* Vasîlê Kîrîlîç Trdeyakovski: (1703-1769) Dibejin, niviskarekê ûrisê bi wê ji

hatiye. Pûşkîn yek ji wan

bikeriya

navûdeng bûye, le ev navûdenge

wê

sembola bekeriya bi kar tîne. (W)

niviskaran

ku wê nave ha

e

wefee

56

Min dixwest... min pir dixwest ku ev gotinen min... wek ku hezretê Eyub dibeje:

"Xwezî anuha ev gotinen min bihatana nivisandin!

Xwezî di pirtûkeke de berhev bibûyana!

Bi penûseke hesinî, bi qurşûne

Li zinaran bihatana kolane ku her û her bimana." Le ez ni kanim, mîre min. Mîna ku tu jî edî tederdixî, ez nikanim û ni visandin ji min naye, ez ji te re sond dixwim ku edî ez nika nim bixwînim jî. Ez e nexwînim, dibeje, we perda reş dikeşe bere pirtûkxana xwe, bi xemgînî û bi dengê bilindtir didomîne:

- Bila li min biborin, bila ew hemû niviskaren ku vekîşyan şikeften behntengîn, seven nîve şevan jiyan li xwe herimandin û jidil xwe sipartin huneren xwe, ew niviskaren ku rûreşî ne kirin, ew niviskaren ku derew û bebextî li lehengen xwe ne kirin, bi wan re jiyan, bi wan re eşyan, bi wan re giriyan, bi wan re ketin û mirin... a bila ew hemû maqûlen erbaben kare xwe li min biborin, dibeje, bi rewşeke jihevketî te li peş portre mîr dîsa di sandaliya xwe de rûdine, beyî ku veke wan name û rojnamen li ser mase dide aliyekî, sere xwe dike nava herdu lepen xwe, di ser çogen xwe de xwar dibe, diponije... û anuha li ba wî dîsa deng tune, dîsa ronahî tune, dîsa wext tune, dîsa Xwede tune û dîsa dünya li dora xwe çerx nabe.

57

Epilog

Di we gave de, rasterast di we gave de ez çûm li peş Carîne Daryo, li peş Darîn î lehenge ve çîroke rûniştim û min göte:

- Baş e, eze binivisînim.

Bi mitûmatî li min meze kir û got:

- Tu e çi binivisîni?

Min got:

- Van gotinen te... ez e van gotinen te binivisînim û bikim pirtûk. Ez e yeke wele binivisînim ku bi hemû dewr û dewranan xweş be, herkes bi zimane xwe î arizî şirove bike û li ba xwe rûmeteke bideye.

Bi xemgîni, bi çaven tije av got:

- Tu e cima binivisîni?

Min got:

- Te gotinen bave xwe bi cî ne hanî, te daxwaza diya xwe bi cî ne hanî, le ez e ve eşa te bi lev bikim.

Mîna ku ev behsa de û bave wî wan çaven wî biguvişîne av je rijiya û got:

- Na, meke!

Min got:

- Cima na? Ma te ne got, xwezî anuha ev gotinen min bihata nivisandine?

Bi gireken tiliyen xwe çaven xwe zuwa kirin, li min meze kir û got:

- Na, hezretî Eyub weha gotiye.

58

Min got:

- Te cima ev gotinen hezretî Eyub bi lev kirin?

Hustuye xwe xwar kir û got:

- Dile min tenik bû û min jî ev gotinen wî bi lev kirin.

Min got:

- Baş e, dile min jî li van gotinen te rûnişt û ez dixwazim wan binivisînim.

Di dest de li min vegerand û got:

- Ku tu bi gotina dile xwe bikî û binivisîni, tişte ku ez ji te re bibejim tune. Le tene tişteki... ji min nepirse û nebeje ci ma, le ez tişteki tene ji te daxwaz dikim.

Darîne Daryo, Darîn î lehenge ve çîroke daxwaza xwe ji min re bi lev kir. Li ser ve daxwaza wî li peş mîr Celadet Alî Bedirxan û li hafa seydaye erd û asiman Ahmede Xanî min jî soz da ye ku ez li dawiya ve çîroke van gotinan jî binivisînim û bibejim: "Ev çîroka ha dive bi zimanekî din neye xwendine, dive her û her bi zimane xwe î male bimîne."

Herweha nîve eşa lehenge xwe min je girt, nîve titûna qelûna wî ya dawîn min kişand, nîve hesiren wî min ji kaniyen çaven xwe rijandin, li nîve texte wî ye razane min cî da xwe, we şeve nîve balîva wî min sere xwe da ser û em bi hev re ketin xewe.

59

Nakokî

Yekî ku xweng an jî biraye wî hebe, bi ve nakokiye dizane. Ne xem e ku ev xweng an jî biraye ha je mezin an jî piçûktir be. Ya girîng, di navbere de zede sal tüne bin. A we çaxe, di demen zaroktiye de nakokiyek e di navîna wan de pel bide. Tew ji bextreşî re ku ew xweng û biraye ha jî hemcinsek bin, ev beyomiya ha e xurtir bibe.

Ji rojan paşnîvroya rojeke payîza navîn e. Li ba me karen ku

di ve deme de li gundan were kirin, hemû jî ji bo amadeyiyen zivistane ne. Li hewşa me ya mezin, bave min qoncekî gir da ye ber xwe, ji keşa ezîngen me yen hewşe, hemez bi hemez tî-ne datîne ber vî qoncî û yek bi yek li ser hûr dike. Diya min jî beroşek şorbe daniye ser argûne hewşe, anuha jî ji bo şorbe xerîkî sorkirina pîvaz û qelî ye. Herweha vatiniya kişandina wan ezîngen ku bave min hûr dike, li ser min û biraye min e. Biraye min bi xwe neh salî ye û bi qasî saleke jî ji min pi çûktir e. Ev rengdera piçûktiye ji bo wî dayîneke Xwede, şûr û mertalekî parastine ye. Ve yeke ez dû re tedigehîjim. Çi bixwaze, çi bike û bibeje, dive ez bi ya wî bikim. Dema ku ez bi ya wî nekim, qerin û giriyeke wusa dike, ya sitar, meriv dibije qeye mar pe girtiye. We çaxe jî bave min di hewara wî de te, beyî ku bizani be çi bûye û çi qewumiye, peyvan li ruye min dixê, li min hers dibê û dibêje: "Tu mestûmezin î!"

A di we gave de ez ji mestûmeziniya xwe şerm dikim, di hundure xwe de ji xwe hers dibim ku cima ez ji biraye xwe

60

mezintir im, cima ez bi dû wî re ne hatime ve dunyaye. Di her demen weha de diya min dibîne ku ez çiqasî li ber xwe dikevim û ji xwe deşim. Loma piştî bûyeren weha diya min te, beyî ku nola bave min li min tene hers bibe, bi dilovanî desten xwe yen qertûşî di sere me herduyan re dide û dibê:

- Cima hûn bi hev nakin, ez bi qurbana we... qaşo hûn birayen hev in? Dive hûn ji hev hez bikin ku Xwede jî ji we hez bike.

Ji min û biraye min, bave min betir li wî xwedî derdikeve.

Ne ku ez çavnebare ve yeke me, na! Le di her çaren weha de, ji ber ve piştgiriya bave xwe, ez dibînim be biraye min çiqasî pozbilind, kaw û nerind dibe. Bi taybetî jî dema ku dibihîse bave min bi nave Qumandar banî wî dike û dibeje: "Ka Qumandar li kudere ye?"

Mîna ku bi rûmeta ve rengdera ha bizani be, di her çaren weha de biraye min jî bi serbilindiya Qumandarekî ber bi he-meza bave min dibeze.

Ez û Qumandare xwe î piçûk em wan ezingen hûrkirî ji hewşe dikişinin hela hundur û li aliyeke xaniye me î male em dinijinîn ser hev. Di kişandina ezingan de her gava ku em li hundur pergî hev ten, ji bo ku ez beşim çî ji deste vî Qumandare min î piçûk te, ew dike. Ji xwe ew edî bike jî û neke jî, ez bi her tevgereke wî deşim. Bi reveçûna wî, peyivîna wî, lîstiken wî û tew carina bi giriye wî jî. Dema ku digirî jî, bi min wusa te ku ew dixwaze min biqahirîne. Le ji bo ku bave min li min hers nebe û ji min re nebeje: "Ma tu piçûk î!" heta ku ji deste min jî te, ez xwe ji van şeytaniyen biraye xwe î piçûk dûrdixim, piri caran bi wî re nalîzim û napeyivim jî. Mîna ku anuha tew birayekî min î weha tune ye û bi wî re ezingan nakişînim. Mîna ku hebûna wî ya nuha tew bala min nakişîne û

61

herweha em bi awuren tûj di ber hev re derbas dibin. Behna pîvaz û qeliye ku diya min di rûn de sor kiriye, ne te ne li hewşa me, herweha heta hewşen cîranan jî belav bûye. Baş xuyaye ku ev behna ha li xweşa bave min jî te û loma her cara ku dasa tûj bera ser ezingen ter dide, fişîl û perçen piçûk

ji ber deve" dase dipengizin û li hawurdor belav dibin.
Bi tariya evare re diya min ji bo min û biraye min î piçûk
şorbe dixê namkiyeke û datine ser sekûka hewşe ku hinekî sar
bibe. Piştî deh deqeyeke jî bi kefxweşiya kare ku me kiriye, bi
min û biraye min dide zanîn ku em biçin ser sekûke û beriya
ku tarîtir bibe, em nane xwe bixwin. Ez û biraye xwe diçin, li
ser sekûke li ber xwarina xwe rûdinin, le wekî du dijminan.
Tariya evara payîza navîn xwe dagirtiyê ser erde, le meriv xwa-
rina ber xwe ji hev derdixê.

- Diya min ev perçe ha ji bo min xistiye namkiye.

Vî denge ha ez ji nişka ve ji biraye xwe an jî wek ku bave
min dibije, ji Qumandare xwe dibihîsim û dibînim ku perçekî
wekî nîvgoşt û nîvhestî di namkiye de ye. Di we gave de dile
min dike gurpegurp. Ez dizanim ku ev perçe ha e di navîna
min û biraye min de bibe sedeme çî naxoşyan. Di dile xwe de
ji diya xwe ya serîn hers dibim û dibejim: "Diya min jî edî fe
ri xwiyekî nû bûye!" Ji ber ku ne xwiye diya min e ku perçen
qelî tomarî baveje şorbe. Tişte ku ez dizanim, hertim çend cî
qelî tîne, bi tiliyen xwe yen pîrozwer ji hev vediçire û wusa da
veje ber şorbe. Navekî jî li ve şorba xwe dike û dibije, Şorba
Qelî. Le anuha mîna ku diya min jî edî bixwaze ve nakokiya
di navîna min û biraye min de mezintir bike.

Ya rastî diya min dizane ku em zede li hev nakin, le bi me-
ziniya nakokiya me nizane û weke diyen hemû zarokan, ew jî
guh nade ve pirsê me. Loma piri caran weke anuha xwarina

62

min û biraye min di namkiyeke de dide ber me û tew ve çare

perçekî goşt tene jî xistiye. De were safî bike! Bi kemanî du perçe texista namkiye an jî ew perçe ha bi du ciyan bikira, dî sa dibû. Lewra ez dizanim ku ez ji bo perçekirine jî li wî perçeyî binerim, biraye min e biqîre û edî hûn jî dizanin be ew e çi bibe! Loma hîn di destpeke de ez biryara xwe didim ku xwe tekili wî perçe nîvgoşt û nîvhestî nekim.

Ez û biraye xwe rûniştine û em bedeng şorba xwe dixwin. Li wir li ser xwarine ez bedeng im. Biraye min î piçûk carina qeşmeriyan dike:

- Diya min pir ji min hez dike, dibeje, kevçiyê xwe bi wî perçeyî dike, pe dilîze ku ez jî tiştêkî bibejim. Le wek ku min got, hîn di destpeke de min xwe ji xwarina wî perçeyî kiriye, min deste xwe je şûştîye û ez nayem provakasiyone. Beyî ku ez bi wî re bipeyivim an jî li wî binerim, şorba xwe dixwim. Li gel ku ez rû nadime wî jî her ew qeşmeriyên xwe dike:

Kevçiyê xwe li bine namkiye dixîne, ji bo ku balkeştir be dike firefir, fena kalen bediran dike milçemilç û carina jî kevçiyê xwe bi wî perçe nîvgoşt û nîvhestî dike û dibe:

- Dive tu bizani bî ku ev goşte ha diya min ji bo min xistiye şorbe! '

Ez di hundure xwe de dikelim, şeytan ji min re dibe: yekî li kursiya deve wî bixîne û hew! Le ez nalete li çave şeyten jî tînim û denge xwe nakim. Ez baş dizanim ku rrjebesta biraye min î piçûk ne xwarina wî perçeyî ye, le ew dixwaze ez bi wî re bipeyivim, an jî beşim. Piştî çend kevçiyên bedeng, biraye min î piçûk dîsa kevçiyê xwe bi wî perçeyî dike û dibeje:

- Dive tu ji bîr nekî ku ev perçe goşt, ye min e!

Le min bedengî kişandîye sere xwe û ew jî her didomîne:

- Ev goşte ha, ye min e û ez e bixwim.

63

Ez jî nizanim be çawa bû, le ew hemû eş û hersa ku ji piştî nîvro û heta nuha min di hundure xwe de berhev kiriye, ji nişka ve ji deve min derdikeve û ez dibejim:

- Tu dixwî bixwe, şeytan lawe şeyten!

Çawa ku zike merivan ji xwarina nokan dinepîxe û piştî barbarane rihetiyeke digire ser meriv, bi gotina ve hevoka xwe re ez jî tiştê wusa hîs dikim. Le tavile li xwe divarqilim ku her du peyviken min yen dawîn ne baş in. Gumanek bi min re çedibe û xwe bi xwe dibejim: "Nebe nebe, ev firqûza anuha giliye min bike." Bi ve gumana min re biraye min î piçûk dike qerîn û dibe:

- Bavo?...

Gwîne min divemire û dile min dike gurpegurp. Denge bavo jî bilind dibe û dibe:

- Çi ye, Qumandar?

Ve çare jî Qumandar di ber xwe de ji min re dibeye:

- Ez bibejim?... kero welle ku ez bibejim, bavo e li te hers bibe!

Ew tirsê min hinekî dadikeve, bavo li pirsê xwe xwedî dernakeve û wusa xuyaye ku Qumandar jî bi qasî du se hilman xwe ji bîra dike. Di ve fesale de ez zûzûka ji ber namkiye radibim, tev wî perçe nîvgoşt û nîvhestî ez namkiya şorbe ji biraye xwe î piçûk re dihelim û xwe bi şûn de vedikişînim.

Heta ku bave min destê xwe dişo û ew jî te li ser sekûke rûdine, ev biraye min firqûziyan dike. Piştî ku ez dibînim bave

min te, edî ez yekser bedeng im. Di ve gave de jî di dile xwe de banî Xwede dikim û gelekî dixwazim ku biraye min dîsa hi nek nerindiyan bike. Nerindiyan bike ku bave min bi xwe jî bibîne be ew çî firqûzek e. Le ji şeytanî re maqûliyeke wusa bi biraye min î piçûk digire ku tew nepirsin! De qeye firqûzen
64

heri firqûz jî di jiyana xwe de careke maqûliyeke dikin! Bi go tineke din, bi awakî ku piçûkiya xwe bizani be, bi milçemilç- eke zarokane nane xwe dixwe. Ev yeka ha naye we mane ku biraye min î piçûk ji bave min ditirse, na. Heta nuha jî min ne dîtiye ku ew ji bave min tirsiyaye. Ji xwe min ne dîtiye bave min jî li wî xistiye, an bi awakî ku ew bitirse le hers bûye. Di ve navbere de diya min ji bo bave min jî namkiyeke şor be tîne û li ber datîne. Bave min weke hertim dîsa bi bextiyarî li biraye min î piçûk dinere, ji serbilindî leven wî dilerizin, sere xwe ber bi diya min bilind dike û je re dibe:

- Qumandare min alifxweş e.

Qumandare alifxweş ji ve gotina bave min kefxweş dibe, di bin çavan re li bave min dinere, mîna ku bixwaze gotina wî rast bipeyitîne, bi deste xwe radiheje wî perçe nîvgoşt û nîv hestî, berwar ber bi deve xwe î piçûk dibe û gez dike. Bi gezkirine re qerînek bi biraye min dikeve, bi hers û girî wî perçe ha ji deve xwe derdixe û ber bi peş daveje. Ew perçe nîvgoşt û nîvhestî, bi gotineke din, ew perçe ku edî xwendevan jî pe di zane, li hundure namkiya ber bave min dikeve. Şorba ku ji namkiye dipijiqe serçave bave min, ew girî û qerîna ku ji nişka ve bi biraye min î piçûk dikeve, bave min dîn dike. Na, dîn

nake, le bi hersa dînekî radibe û xwe dikeşe biraye min î piçûk. Heta nuha jî min ne dîtiye ku hers li bave min wusa mezin bûye. Gerçî du se caran diya min weke kevoka aştiye di navî na bav û biraye min î piçûk de xuya dibe, le bekes e. Ez edî baş tedigehîjim ku di rewşen hersbûyînen weha de ne tene Qumandar, Generalen heri mezin jî nikanin xwe ji deste bave min bifilitînin. Dest û deve bave min nahewe û her dibeje:

- Ev çî çelrûtî ye, kûçik lawe kûçikan!... kero welle ez e se re te bipelixînim!

65

Biraye min li ber şîlpîna silen bave min wekî cewrekî kûçikan dike kûzekûz. Dilovaniya diya min pe digire û dîsa xwe daveje ser biraye min î piçûk, li ber bave min digere:

- Xwede dihewînî, de bes e, dibeje û di ber re jî dike ku biraye min bihewîne:

- Çi bû, ez bi qurban? Ew çî bû te havet?

Biraye min bi kûzekûzeke dilşewat dixwaze tiştina bi diya min bide zanîn, le hîskehîska wî re nade gotinen wî û nîvçe diminin.

-Ew... perçe... ne... goşt... ezing...

Diya min bi bal û şikebarî li namkiya bave min dinere û fişîlekî ber deve dasî te de dibîne.

Ez tavile tedigehîjim ku ew perçe ha, ne perçekî nîvgoşt û nîvhestî bû, diya min ew ji bo biraye min î piçûk ne kiri bû namkiye. Beriya ku em li ber namkiya xwe rûnin, fişîlek ezing ji ber deve dasa bave min pengiziye û hatiye ketiye namkiye.

Piştî ku bûyer te famkirin, diya min bi dilovanî deste xwe di

sere biraye min re dide û dibe:

- Raweste, ji lawe xwe re ne tene perçeyekî, ez namkiyek ti-
je qelî bînîm! Ava reş di çaven min de were, cima min ji lawe
xwe re du perçe qeliye tomarî navet ber şorbe!

Xwede dizane dile bave min jî ji van gotinen diya min nerm
dibe û tiştêkî weke poşmaniye xwe le dide der. Loma bere xwe
bi biraye min î piçûk de dike û dibe:

- Qumandare min baqil e, mer e, le... ev fişîle ezing sere
xwe bixwe!

Bave min wî perçe ezing ji nav şorba ber xwe derdixe, piçe-
kî bilind dike ku em giştik le binerin, dû re bi aliyekî de dave
je, herdu desten xwe vedigire û bi bergerîn banî biraye min di
ke:

66

- Were, Qumandare min, were! Were hemeza bave xwe!
Le Qumandare bave min naçe. Mîna qumandarekî ku ji
apoleten xwe bibe, ew di hemeza diya min de bi awuren behe-
vî û vala li hemeza bave min dinere.

67

Xoce Xizir

kuxikeke beyom re Fariz ji xew şiyar dibe. Di bedengiya şe-
Bi

va nîve şeve de li paş piştta kewaniya xwe, desten xwe dide ber
eniya xwe û heta nave di bene lihefe de rûniştiye, diponije. Ji
beyomî an jî ji firqûzî be jî, ev kuxiken wusa bewext carina
hişk û direj dajon. Uhu!.. Uhu uhu!... Uhu uhu uhu!... Her

weha kewaniya li paş pişta wî bi narihetî şiyar dibe û bi dengê serxew dibeje:

- De biçe qultek av vexwe, gidî!

Fariz hedîka radibe, bi we kuxîna gaveke bere ber bi aşxane diçe, ji dereke radîheje piyaleke, dibe şîrîna ave, dadigire û vedixwe. Di danîna piyale de ji şeytanî re piyal ji dest dişemite, dikeve erde û bi dengê kambax dişike. Bi awakî wusa dişike ku hûr li ser hûrekî namîne. Fariz xwe bi xwe dike pile-pil: "Xer e însallah!" dibeje, ber bi sinike diçe û tîne ve çare bi xuştexuşt wan deran paqij dike.

Li hela din kewanî jî ji xewa xwe bûye û anuha bi uf û ofîn xwe di bine lihefe de diqepijîne. Piştî van hemû beyomiyen îşevîn, Fariz te, kuje lihefe radike, nola bere dîsa heta nave xwe dixwe binî û di nava nivînan de rûdine. Kewaniya ku xew le reviyaye, di we nîvtariye de bere xwe bi Fariz de dike û di beje:

- Çi bû, te piyal şikand, ne wusa? Mîna ku cin bi te ve xuya bibe, tu dîsa ve şeva nivî şeve rabûyî... Çi bûye bi te, gidî!

- Xoce Xizir bi min ve xuya bû, xatûn. Ne cin!...

68

Xatûn bi qerf dibe:

- Hi! Xoce Xizir... Xoce Xizir piyalan bi merivan nade şikandine!

- Ew tişteki din e... Ew jî xer e. Diya min digot: Dema şûşe bişike, ronahî ye.

- Ere, le... ronahiya helbestvaniya te ya tariya şeve ye!

Li ser van gotinen kewaniya xwe Fariz hinekî bi enirin di

beje:

- Sere we mîna sere mirîşke ye! Çi ji helbestvaniye fam di ke? Rabûye bi helbestvaniya min jî tinazen xwe dike!...

Mîna ku jina wî nikani be guhdariya van gotinen wî bike, sere xwe ye weke sere mirîşke bi hela din de dike û bi pilepil dibije:

- Xwedeyo, nuha helbesten wî jî helbest buya!... Di ser de jî radibe helbest, rûdine helbest, radikeve helbest... Ez gejbûm edî! Ji bilî mijara helbeste nema bi te re te peyivîn. Bes e gidî!...

Fariz dest daveje bişkova lampa paş sere xwe, vedixe û mîna ku nû serwextî tişteki bibe, bi awakî heyfane dibê:

- Min nizanî bû ku tu e wusa zû ji helbestan ter bibî... Ku hemû xwendevanên min jî weke te ji helbesten min ter bin, ez e jî penûsa xwe bişkînim û edî nenivîsînim. Le, na! Ez dîzanim ku tişteki wusa tune. Tene... ev demek e ku te rika xwe li helbestvaniya min û hunera helbeste gîredaye û hew.

- Ne tene ez... bi nave Xwede hemû kes di ve baweriye de ne û dibejin: Fariz ji bilî helbest û helbestvaniye edî nizane bi peyive. Ji bilî helbeste, meriv je re çelî çî jî bike, ew tew guhdarî nake. Ji jiyana rojane, ji danûsitandinên sosyal bepar bû ye.

- Ma ka anuha min ji te re peyva helbeste bi lev kir? Dîsa te

rabû ev mijara li dar xist. Ê bawer bike, ez bi nave hemû tiştên pîrozwer sond dixwim ku ez e ji vir û weha li ber te an jî ji te re qala helbest û tiştên weha nekim. Ha!... beriya ku ez ji

bîr bikim... dive tu bizani bî ew hemû kesen ku di paş min de van gotinan jî dikin, qeşmer û xernexwaz in! A anuha em werin ser mijara xwe. Min ji te re got ku îşev Xoce Xizir bi min ve xuya bû...

Mîna ku tiştêk biniquete dile kewaniye, dîsa bere xwe bi Fariz de dike û dibe:

- Ma tu rast dibejî?

- Ez rast dibejim, le. Min di xewna xwe de dît.

- Xewna te bi xer be, ca bibeje te çî dît. Hevîdar im ew jî ne li ser helbeste be.

- Na, rasterast ne li ser helbeste ye, le xewneke helbestane ye! Ê ji anuha ve jî peşîye li min nebire. Raweste, heta dawîye guhdarî bike û dû re gotinen xwe bibeje. Em werin ser xewna min. Bele, rasterast Xoce Xizir bû. Ere wî bi deve xwe ji min re ne got, le ez dizanim ku ew Xoce Xizir bû. Tu guhdarî bike be çawa bû: Weke du sal beriya nuha, ez li pala çiyaye me î jorîn bûm. Ev ji kengî ve ye ku min xewna wan deveran ne dîtîye. Şiv di dest min de, ez li ber pez bûm. Ji nişka ve (Dapîra min jî digot, batiniyen baş û Xoce Xizir ji nişka ve bi merivan ve xuya dibin) merivekî bi bejneke direj û paltoyekî sipî, (Ji van paltoyen ku xwendevan li xwe dikin'...)

Deste kewaniye ber bi zike xenî li ba dibe û dibe:

- Anuha tu dev ji şirovekirina xewna xwe berde. Direj û serîn jî neke!... Te çî dîtîye, bibeje û hew!

- Ere, ere... ez dizanim ku hinekî helbestane dibe, le... Le ez dixwazim ku tu baş tebigehîjî. Bele, em li kudere ma bûn?... bi bejneke direj û paltoyekî sipî ji hela raste ve bi min ve xu-

70

ya bû. (Diya min digot, tiştên ji hela piye raste ve, hertim bi xer in.)

Deste kewaniye dîsa li ba dibe û:

- Ev ne rast e, dibeje, lewra kevirek jî dikarie ji hela raste ve li sere merivan bikeve û bibe sedeme mirina meriv.

- Min got, ji bona Xwede peyva min nebire û tu jî careke bi qedire Xwede bike. Ma kevir e bibare!

- Baş e, bidomîne!

- Bele... bi min ve xuya bû, hedî hedî ber bi min hat, silava Xwede li min hilda û... (Wusa diniqute dile min ku ev silava Xwede ne tiştêkî vala ye, Zerîxan) nave min, nave de û bave min, eşîra min û bi kurtî merik hertişt ji min pirsî. Dû re ji min pirsî ka xwendin û nivisandina min heye an ne. Min jî pe da zanîn ku ez ne xwediye hîngiriya dibistanen bilind im, le ez hinekî bi nivisandine dizanim. Min xwest ez wî serwext bi kim ku ez bi qasî nivisandina helbestan dizanim, Zerîxan. Ew meleye ku min li cem ders girti bû, min nave wî jî je re got. Le diyar bû ku wî mele nas ne dikir. Ji xwe ne pewîst e ku Xoce Xizir herkesi nas jî bike. Loma piçêkî xwîdan da û mîna ku hi nekî jî şerm bike. De qeye Xoce Xizir jî xwîdane didin û şerm dikin. Le ev hemû aliyan xewna min çîrok e, Zerîxan. Em werin ser gotinen wî yen girîng. Ya rastî, tene ji bo min girîng in. Ma tu dizanî be çi digot? Deste xwe... dibejin ku desten Xoce Xizir nerrn fena pembo ne, le bila di navîna me de be, Zerîxan, deste viya hişk mîna deste min û te bû. Bele, deste xwe da ser mile min û...

Li vir kenekî bewext bi Zerîxane digire û bi kene xwe re dibe:

- Ca bisekine, ez ji te re bibejim be ew hişkiya çi...

Fariz bi lez deste xwe ber bi deve Zerîxane direj dike û di

be:

71

-Ji bona Xwede tu heta dawîye guhdarî bike! Tu şirova xwe dût re ji min re bibeje.

-Baş e, bibore... bidomîne. Ha, ha, ha!...

- Bele, ... deste xwe da ser mile min û got:

"- Te çi ji ve jiyane dive?" Bi ve gotina wî re gotinen xaltiya min ya rihmetî ketin bîra min. Digot: "Di rewşen weha de dive meriv tew nesekine û tavile daxwaza dile xwe bi lev bike." Le ev daxwaza dile min bi qasî du se hilman wext girt. Ez di navîna du daxwazan de ase bûm, Zerîxan. Ya rastî dilekî min ji bo axiret û îmane, dilekî min jî ji bo navûdenge nivis kariye pel da. Tu e anuha bibejî viya dîsa dest bi helbestvaniye kir, le ji bona Xwede heta dawîye guhdarî bike û bihele ku di ve xewna xwe de min çi û çawa dîtîye, ez yek bi yek hemûyî bibejim. Meriv, çi aferidekî çavnebar e, Zerîxan! Ez nizanim tu bawer dikî an ne, le di xewne de jî min bi wî ruhe pîrozwer da zanîn ku ez dixwazim ji xwe re helbestan lekim. Mîna ku ew ruhe pîrozwer jî bixwaze ez vî kare ha bikim, li vir pişirîneke serîn li ruye wî belav bû û dût re hinekî fikirî. Ez ji te re tiştêkî bibejim, Zerîxan, rî û simbela wî tûne bû. Le ji bo serwextiya wî, min rabû çelî hunermendiye, çelî xweşikbûyîna helbeste... bi kurtebirî min je re çelî hemû pejnen dile xwe kir û pe da zanîne ku ez sermeste hemû tiştên helbestane me. Piştî van gotinen xwe, min kir ku ez helbesteke xwe ya kurt jî je

re bixwînim. Le denge min dernediket, Zerîxan. Wî rabû ji berîka paltoya xwe î sipî hekek dencist, aliyekî heke qul kir, sipîçika we rijand, di wî ciye qulkirî re tîfî hundure we kir, bi deste xwe direjî deve min kir û got:

"- Vexwe!" Peşîye dile min ne bijiyaye. Min nizanî bû şela Xoce Xizir wusa ye, Zerîxan. Le çer ku deste wî ye nerm... A ve çare jî deste wî bû weke deste Xoce Xizire rastkîno, angoye

nerm bû, nermekî wusa xweşik û wusa helbestane bû ku!... Ew kene ku bi gaveke bere bi Zerîxane girti bû, anuha dîsa xwe le dide der û dikene. Le li ser lavakirina Fariz, ew peyva wî nabire. Loma Fariz jî her xewna xwe didomîne:

- Bele, çer ku deste wî ye nerm bi leven min bû, min çaven xwe girt û ew heka vexwar. Bi vexwarina min re vegeriya ser min û got:

"- De anuha helbesta xwe bixwîne." Min xwend. Min xwend, le bawer bike heta nuha jî deng û qerîneke weha xweş bi min ne ketiye, Zerîxan. Xwedeyo, min weke mewlûdeke pî rozwer dixwend û vî denge min li pala çiyayen hember olan dida. Ji min wetre hemû meriven dunyaye guhdariya min di kirin û viya jî ez bi vî awayî şirove dikim ku helbestvanekî mezin e ji min derkeve, Zerîxan. Ne tene ez, wî bi xwe jî... Xoce Xizir bi xwe jî bi min da zanîn ku ez e bibim helbestvanekî mezin. Di we xewna xwe de (Ez î kü ne ewqas nefspiçûk im) min rabû nefspiçûkî kir û je re got:

"- Şeyda, ez ne li pey navekî mezin im û..." Le wî peyva min biri û got:

"- Ma çîye te ji niviskaren mezin kemptir e! Tu e jî bikani bî weke hemû helbestvanen mezin binivisînî. Û tew ji anuha ve jî ez dirûven niviskaren mezin di te de dibînim." Dû re bi min da zanîn ku poze min jî li poze Pablo Neruda çûye. Le min ciwamerekî bi vî navî ne dîtîye, tene min bihîstiye û hew, Zerîxan. Gelek wersiren nivisandine jî ji min re got. Serqise, bi min da zanîn ku ez di helbesten xwe de ji xwîn û kuştine ne-tirsim. Bila hertim behna barut, xwîn û kuştine ji helbesten min were. Weke nokan, bomban bi kar bînim, agir bera ordiyen mezin bidim, çaven generalan bi kevçiyên derînim... Ji xwe stîla min jî van tiştan xweş dihewîne, Zerîxan. Le tu zanî

73

çi, Zerîxan? Dû re deve xwe ber bi guhe min direj kir û tişte kî bi dizî jî ji min re got: Got:

"- Bila di navîna me de be, (Ya rastî, li vir gumanek bi min re çebû, lewra heyf e ku zatekî wusa pîrozwer tekeve rewşa fi-sekiya meriven îroyîn) xwendevanên anuha ji tiştên weha hez dîkin û di roja îroyîn de juriyên xelaten edebiyate jî li gor van tiştan xelaten xwe belav dîkin." Ji min re çelî nexşên rewşenbîriye jî kir. Digot:

"- Dema tu di civateke de rûdinî, hertim destekî xwe bide bine argûşa xwe, bi taybetî jî dema ku weneyên te tene kişandin, tiliya xwe ya eşhede bide ser gupa xwe, çaven xwe hûr û piçûk bike ku renge helbestvanekî giran û mezin bi te bike ve..." Xoce Xizir wekîdin jî gelek tiştên helbestane gotin le anuha nayan bîra min.

Piştî van gotinên xwe Fariz bere xwe bi kewaniya xwe de

dike û dibe:

- De ka icar tu şirove bike, şirove bike be ev xewna min ni şana çi ye?

Beyî ku birame kewaniya wî bi zarekî tinazane dibeje:

- Şirova xewna te ew e ku... wek ku ez hertim dibejim, tu bi xem û xeyalen helbestvaniye radikevî. Bi gotineke din, di bejin ku mirîşik di xewna xwe de qût dibîne. Ew hişk û nermiya deste Xoce te î Xizir jî... ma tu dizanî be te di xewe de çi dikir? Ha, ha, ha!... te xwe li min dipeland... Ha, ha, ha!...

Fariz bi enirin û bi dengê behevî di ber xwe de dike pile-pil:

- Ez je re qala çi dikim, ew diçe bi çi awayî şirove dike!

Bi qasî çend hilman ode bedeng dimîne.

Mîna ku giraniya xeweke herimî xwe li ser piştta çaven ke waniye giran kiri be, xwe dizivîne ser hela din, bere xwe bi
74

aliye din de dike û bi dengê sencewî dibeje:

- Denge xwe bibire, ez hinekî rakevim...

Bi van gotinen kewaniye re nola ku tişteki din hati be bîra

Fariz, zûzûka weha dibeje:

- Ha!... hindik ma bû ku min ji bîr bikira. Wî zatî ji min re tişteki weha jî got: Ji min re got:

"- Tişte xwe yen kevin naveje." Min weke şekal û göre fam kir, Zerîxan. Ez wusa tegehîştim ku rojek e were, rûmeten van hemû tiştên berûmet e hebin. Ew e berhev bikin û di muzeyan de, di paş caman de daynin. Ez bawer im we çaxe ew e nivîseke weha jî di bînî de binivîsinin û bibejin: "Şekal û gören hel-

bestvane mezin û heja, Farize Beşe."

Kewanî di xewxilmajiyêke giran de bedeng e. Helbestvane mezin û heja Farize Beşe jî xwe di ber kewaniya xwe re direj dike û heta ser defa sînge xwe lihefe dikeşe ser xwe. Le ji bandora ve xewna xwe ya îşevîn zû bi zû nafilite. Heta demeke di rej jî çaven wî her li bine zike xenî zîq dimîne û hertişt, hertiştên ku ew dibîne û nabîne, di we gave de je re bi awakî hel bestane dixuyin.

75

Monsieur et Madame N.

Di şevşahiyeke welatiyen me de li restauranteke bajare X'e ez jî li ber maseyêke hevaltiya şûşa xwe dikim. Ji bilî min beyî jin û malî kesek tune, ku hebin, Xwede dizane wan jî li keleka xwedîmalan cî dane xwe, bi kemanî diya xwe an jî nasen xwe yen biyanî bi xwe re hanine ve şeva pîrozwer.

Her cara ku ez piyala seraba xwe ber bi deve xwe radikim, çaven min jî pe re bilind dibin û ez dibînim. Dibînim ku beşdaren ve şeve çiqasî bextiyar in. Bextiyariya wan ji tevgeren wan, ji xwarin û vexwarina wan diyar e. Le dîsa jî ku yek rabe û ji hemû mevanen ve restaurante bipirse: "Ka bextiyartirîn kesê ve şevşahiye kî ye? beguman dostekî min î kevin e rabe û bibeje: "Ez im!"

Bi qasî se masan ji min dûr li keleka dîwer li dor maseyêke gilover du mer û du xatûn rûniştine. A ji wan meran yek, ev doste min î kevin û bextiyar e. Paşya doste min bi min de ye û ew min nabîne. Herçiqas jî zû ve me hevdu ne dîti be jî, min dil nîne ku ez di we gave de biçim û bibim xwedîpare bextiya-

riya wî. Bi bextiyarî piyala xwe bilind dike û bi hevalbenden dora xwe re dinoşîne. Di her çaren ve noşandine de doste min bi paş de ditewe û jora sere wî dibiriqe. Dora sere wî bi pirç û jora wî rût e. Bi gotineke din ku hinek fantaziyen meriv hebe û biçe li paş vî doste min bisekine, ji jor der le binere, meriv e bibeje: "Xwede bi zanatî Ê'yeke bekumik bi jora sere wî ve zeliqandiye."

76

dibuhure, hemû mase hedî hedî

Bi qasî saet û nîveke wext

ji giraniya xwarin, kevçî û çetelan sivik dibin û şûşe jî li ber valabûne ne. Ez dibînim ev doste min çawa ji ber masa xwe ra dibe, ber bi xatûna peş xwe ditewe, tiştina je re dibeje, ji bo yen keleka xwe jî silaveke destûrane dide û ji wir ber bi hela min te. Li hela min, bi gotineke din, masa min li keleka barre ye û riya tuwalete jî di ber min re diçe. Doste min bi dijwarî dilive, carina li paş xwe dizivire, dilikume û te. Bi ve hatina xwe re çer ku çav li min dikeve, herdu desten xwe ber bi min radike, kujen çakete wî bi herdu aliyan de ba digirin û dibe:
- Wey, wey, wey!... De ji xwe re le binerin... ez ke dibînim, ji kengî ve ye, ezbenî!...

Li ser lîngan ez deste wî dişidînim û dibem:

- Bi rastî jî ji zû ve ye... le ez dinerim ku tu îşev xweş û kefxweş î, bextiyariya te bepîvan e, doste min.

- Ma kef û xweşî... ma bextiyarî jî gotin e, ezbenî! Ez dikanim bibejim ku ewk e... di roja îroyîn de ji min bextiyartir dî sa ez im. Tu e bibejî çawa?... Te bîra min, ji bo ku ez formeke

munasib bidime xwe, bi saetan min ewk dikir.,, min bi neynikan re pevdiçinî. Bi taybetî jî min xwe ji meriven xwedîjin û malî vedikişand ku ve rewşa min nebinin. Bi kurtî ez di ewkeke de bûm... ez di rezîliyeke de bûm. Le... sikir ji Xwede re piştî ve zewace edî neyniken heri mezin jî... bele, ew jî bala min nakişînin û sere min ewk e... sere min bilind e.

Bi van gotinen xwe re doste min sere xwe jî bilind dike, le ez xwe li nezaniye datînim û weha dibejim:

- Ca le binere, ca le binere!... Xuyaye te jin haniye jî.

-Bele, ezbenî, bele... min jin haniye... binere...

Doste min dîsa li paş xwe dizivire, di ser wan se masan re deste xwe bilind dike û mîna zaroken filîstîniyan du tiliyen

77

xwe dike mîna heçî. Le mebesta doste min ne gotina serketine ye. Lewra ew wan tiliyen xwe dû re hedî hedî dadixe, ber bi simbela xwe ya gir dibe û Xwede dizane bi viya jî dixwaze maçeke bistîne an jî bişîne û didomîne:

- Binere... a çavreşa min li wir e!...

Li wir du çaven reş bi awuren tirş ber bi me dinerin û doste min çelî başiyen zewace dike û ji min re dibeye:

- Bizewuce... Ji zewace xweştir dîsa zewac e. Bi taybetî jî di şev û şahiyen weha de pewîstiya meriv bi ewkeke heye... bi jineke heye. Ez dizanim be anuha rûniştina li ber ve masa hişk çiqasî bi te ewk e... bi te dijwar e! De ka tu li xwe mikûr were û ji min re bibeje... ma tu nabejî: "Ax!... anuha min jî kevinejinek hebûya!" Bele, bele... tu wusa dibejî û ya rastirîn jî ew e! Binere... bi sere xwe û te sond dixwim ku... ji xera ve hur-

meta ha ye ku îro ez jî beşdarî şevşahiyeke weha me. An ne... bawer bike anuha şûşa min di dest min de û Xwede dizane be di vî sale xwe î buhurî de jî ez di bine kîjan dîwarî de rûniştî bûm.

Ez sandaliya li keleka xwe keremî doste xwe dikim û dibe jim:

- Ca kerem bike, xuyaye tu pir ji xatûna xwe hez dikî.

Di rûniştina xwe de doste min deste xwe jî ber bi erde daw-dişîne û dibe:

- Ma hezkirin jî gotin e, ezbenî!... Ku ez pexember bûyama min e di hedîsen xwe de bigota ewk e... min e bigota: "Buhuşta rastkîno di bine lingen jina meriv de ye." Ku ez seroke parlamentoye bûyama, min e bikira ku hemû parlementeren mer bi sere jinen xwe tene sonda welet bixwarana. Ji ber ku sere ji na meriv ewk e... serekî wusa pîrozwer e ku tera hertiştî dike. Bele, li ve dunyaye tiştêkî ku ez je hez bikim, ew jî xatûna min

78

e. Mîna ruhe xwe, mîna roniya çave xwe ez ewk dikim... ez ji hez dikim. Ji bo min ew ne tene jin e. Na, ew hertişte min we

e... çave min e, ruhe min e, guhe min e, hiş û aqile min e... Ji bo ku doste min we xatûna xwe neke hemû deveren îaşê xwe, ez peyva wî dibirim û dibem:

-Jin çawa dibe hiş û aqile meriv ez tenagehîjim.

Doste min xwe li ser sandaliya keleka min berhev dike û di beje:

- Haa!... tu e bibejî çawa? Guhdarî bike. Se çar rojan vî de

riye eywana me her ewk dikir... dikire çireçir. Çir, çir, çir...
dengekî naxoş bû le hişê min di ber de ne diçû. A dîsa ev ru-
hika min rabû û ewk kir... ji min re got:

"- Rabe rûn tebide!" Te got, ere? Nimûneyeke piçûk e le dî-
sa jî ewk e... ca bifikire meriv xwediye jineke, xweşik, kubar,
zana, jîr û merane be!

Bi tevgereke nezane:

- Jin jin e, dibejim, de îcar te ev merane ji kudere dencist,
ez tenagehîjim.

- Min ji dereke dernexistiye, ezbenî... di ve mesela jinan de
jî tiştêk nakeve sere te ku! Merane dibejim, ewk e... bi rastî jî
jineke merane ye. Ev meraniya we, min bi çaven xwe jî dîtiye.
We roje li ser mijara jin û meran em bi yekî re ketin galegale.
Ez nizanim be çawa bû, le ewk bû... min hew careke dît ku xa-
tûna min bi hersê re got:

"- De siktir be, ulan!" û tiliya xwe jî li merik bilind kir. Bi
sere min û te merike reben tew newerî bû denge xwe jî biki-
ra. Te got, ere? Tene bi awakî nermokî zivirî ser xatûna min û
göte:

"- Tu nizanî peyven xwe bikî!" Le tu were ji min bipirse ka
ew dizane ewk bike... peyven xwe bike an ne. Bele, dizane û
79

pir jî dizane. Ji xwe li ser ve zanebûna we îlham hate min ku
ez jî li ser mijara jinan ewk bikim... ez dest bi nivisandine bi
kim. Di nivisa xwe ya peşîn de dibejim: "Gotina ku dibeye: şer
şer e çi jin e çi mer e, pir û pir rast e. Çewtiya ve gotine tune
ye û loma dive mer jî bi meraniya xwe bizani bin û feraqan bi-

şon." Ca bibeje ezbenî, ji niviseke weha re wek merekî tu çi
Li vir ez tedigehîjim ku vî doste min piştî zewaca xwe dest
bi nivisandine jî kiriye û di ber xwe de:

- Rast e, dibejim, ez bi xwe jî feraqan dişom.

- Ere, ere... le ev nivisa min ewk e... ne ji bo yekî wekî te
ye. Ev rasterast ji bo wan serilişken zewucî ye. Min nivisiye ku
ew jî li malen xwe feraqan bişon. Te got çi?

Ez dîsa di şeye doste xwe de ledixim û bi zarekî nermokî di
bejim:

- Rast e, dive ew jî bişon.

- Ma tu bawer dikî ku piştî ve nivisa ha ew serilişken me jî
feraqan bişon?

Nizanim cima, le di we gave de li hemberî vî doste xwe ez
li meraniye xwedî dernakevim, ez sere xwe nerm dikim, dile
xwe nerm dikim, zimane xwe nerm dikim û dibejim:

- Nizanim ku... ku ez bim... ku niviseke weha li ser min we-
re nivisandin, ne tene feraqen mala xwe, ez e rasterast biçim û
feraqen cîranan jî bişom.

Bi van gotinen min re nexşen serketin û serbilindiyeke li ru
ye doste min diyar dibin û dibeje:

- Hevîdar im ew jî ewk bikin... ew jî mîna te bifikirin. De
ka tu were ez te bi xatûna xwe bidime naskirine.

Doste min dest daveje şûşa min û li peşiya min ber bi masa
xatûna xwe dimeşe. Li ser kelekan, ber bi peş û paş wusa di-
80

ku meriv dibeje qeye hemû jî ji ber giraniya we şûşa di
tewe

dest de ye. Ez di dile xwe de: Seraba îşevîn û bextiyariye li se re doste min xistiye, dibejim û dibînim be doste min çawa bi dijarî xwe digehîne ber we masa gilover. Li wir li peş mase beyî daxwaza xwe du se caran li vî aliyî û wî aliyî ditewe, dest xwe î vala ber bi xatûna xwe direj dike, dû re vedigere ser min û dibeje:

- Ev hurmeta ha ruhika min e, çavreşa min e... ev ciwamer û ciwanika din jî cîranen me ne. Ji malmezinen fransî ne. De ma ez û ve xatûna xwe... em ji gere an jî ji bajar teri, di pencere re ewk dikin... di pencere re silave li me dikin û dibejin: monsieur et madame N. arrivent.

A di we gave de ji devereke masen hawurdor bi dengekî fir-qûzane re şûşeyek jî bilind dibe û dibeje:

- Noş, keke N... noş!

Keke N. şûşa di deste xwe de, bi gotineke rastirîn, şûşa min ber bi jor radike, deve we dixê deve xwe, bilind dike û tavile ji deve xwe derdixê. Bi bayekî bewext re, tev kuxikeke nîvçe qumeke seraba sor jî ji deve doste min direve der û pijî ser wî, pijî ser aliyekî we masa gilover dibe.

Ev rewşa doste min ji ber wan çaven reş nafilite û ez dibînim be bi awurekî çawa doste min dadiwerivîne. Le ez dibînim ku di rewşeke weha de awuren heri tûj jî bala doste min nakeşîne. Ê tew şûşa di deste xwe de jî danayne. Bi deste xwe î vala perçek destmala kaxezîn ji berîka çakete xwe derdixê, peşiyê di dev û poze xwe re dide û dû re jî sere we masa gilover paqij dike.

Heta ku doste min, sere mase paqij dike û min jî bi wan di de naskirine, ew çaven reş hîn jî bi wan awurtûjiyan in. Bi eni

rin li doste min diqîre û dibe:

- Te çi ew şûşa ha weke boca kere xistiye destê xwe, ma tu şerm nakî? Te em rezîl kirin!

Ji bo ku xatûn ji ber van tevgerên doste min zede rezîl ne be, ez jî dikevime navîne û dibem:

- Xem nake, xatûnxan, ji xwe seven weha ji bo vexwarine ne. Ku meriv vexwin jî...

- Ku meriv vexwin jî... ne pewîst e ku meriv bi xwe de bi rin û xwe bihetikînin! Ev çend wext e ku ez pede ketime ku xwe biguherîne. Le ez meze dikim j i bo yen wekî we û wî xem nake.

Ji van gotinên xatûne ez di ciyê xwe de sipûsar dibim. Ni zanim ku ez e wekîdin çi bibejim. Le doste min van gotinên xatûna xwe li xwe nagire. Bi renekî alîcenabane serî her hevokeke we, mîna ku bibeje: ez bi qurbana wî zimanî, xwe ji nave û berjor ditewîne. Ve çare jî xatûn hersa xwe mezintir di ke û je re dibe:

- Mîna ehmeqan xwe wusa li ba neke û di ciyê xwe de rûne! Te em hetikandin!

Di rûniştine de mîna ku nû tiştê keti be bîra doste min, destê xwe jî ber bi xatûna xwe direj dike û dibe:

- Ma ne min e biçûya ewk bikira? Min e...

Bi awakî ku xatûn tinazen xwe bi deve wî bike, mîna reqqeke hustuye xwe jî ber bi doste min direj dike û dibe:

- Bele, serzilûte min, te e biçûya mîza xwe bikira û te e şerab jî ji mevanen me re bihaniya!

Mîna ku nû hay ji valayîyeke bibê, dostê min î serzilût şû

şa di deste xwe de dibe tîne, mîna ku bibeje di bextiyariyen ze wace de xwejbîriyen weha jî dibin, bere xwe bi min de dike, ruye wî soromoro dibe, wek zarokekî di bin çavan re li xatûna xwe dinere û di ber xwe de:

82

- Li min ewk bike... xatûna min, li min bibore!... dibeje û dike ku dîsa ber bi barre biçe.

Le xatûna wî li wî nabore, bi herseke merane lingen xwe li erde dide, tiliya xwe jî le bilind dike û:

- De siktir be ulan!... dibeje, bi awurtûjî, bi we herse dest daveje çente xwe û ber bi barre biçe.

Dibe ku mîna Mirina Karmende Çexov di we gave de tişteke di zike vî doste min de naqete, le ez baş dibînim be çawa xwezî di gewriya wî de dimîne, gwîne wî divemire, deste xwe da veje sere xwe î rût û li pey xatûna xwe dinere. Xweş diyar di be ku edî ruye doste min nagire li malmezinen fransî jî bine re. Le dengekî fransî te bihîstin û dibe: Ne monsieur N. le madame N. hers bû.

83

Panorama

Ev mala doste min jî weke gelek malen xortan li ber ligan e. Le doste min edî ne xort e. Bi gotineke din, xelegen salmezîniye li bine çaven wî bazin giredane û qermiçen salen çelî li eniye dane der. Ev dibe payiza şanzdehan ku wî xortaniya xwe li zozanekî henik daniye û ji wan deverina dûr anuha li bakurre dunyaye disitire. Le ku meriv ji vî doste min lava bike û bix-

waze ew qala jiyana koçeriye bike, be çewtî û be kemasî ew e jî bi awayekî wusa jîndar çelî wan reng û nexşen zozanan bi ke ku meriv e bibeje qeye ev tene şanzdeh saeten wî ne ji wan deverina hatiye.

Sere ve evare û anuha jî beyî ku ez je lava bikim ew bi xwe peşine wan deveran dide: çelî henikiya zom û kepiran, behsa zelaliya ava kaniyen zinaran, qala rûniştina li bine kon û reşmalen koçeran, behsa xweşdenge ba û şalûran, çelî efsûniya wan seven zozanan dike û dibe:

-Ji wan seven ba me nûr dibare, ronahî dibare. Li wir her ku şev pîr û tarî dibe, mîna ku meriv lazût baveje ser seleke sor, hejmara siteran jî ewqas pir dibin. Wusa pir û wusa zede dibin ku edî li wan seven asimanen ba me buhusteke ciye va la jî namîne. Di seven heri tarî de jî meriv dikane di ronahiya wan de bimeşe. Meriv ter nabe ku li wan binere. Meriv dixwaze bi çavekî vekirî rakeve. Ku meriv wusa hûr û bi baldarî li sitereke binere piştî çend hilman hesir e bi çaven meriv bike ve.

84

Bi van gotinan re hesir bi çaven doste min jî dikeve, sere xwe dike ber xwe, bi deng û renekî melankoli didomîne û di beje:

- Xwedeyo, ew zozanen me bi bilindiya xwe, bi asebûna xwe, bi harmoniya xwe ewqas rengîn û ewqas xweş in ku li wan deran nan û av jî nakeve bîra merivan. Meriv hez û xurtiya dîwarekî di xwe de dibîne. Li wan deran pewîstiya meriv ji qanûn û hukumatan nabe, li wan deverina meriv dikane be-

yî Xwede û pexemberan jî bijîn!

Li vir doste min bi pejnen tevlihev bi min dide zanîn ku ew e îşev bi de û bave xwe re bipeyive. Li ber telefona xwe teypek jî amade kiriye ku dû re car bi car guhdariya denge de û bave xwe bike, guhdarî bike û bi wan reng û nexşen zozanan sermest bibe, sermest bibe û eşa van şanzdeh payizan ji kula di le xwe derbike.

Bi kefxweşiyêke veşartî ji piyala xwe we qulta dawîn jî ber bi min bilind dike, beriya ku ber bi deve xwe bibe, bi çaven avî li min dinere û hew. Le ew ava ku di çaven doste min de diçirûske, diyar dike ku anuha ev pejnen wî çiqasî germ in. Bi germiya van pejnan destê xwe ber bi min vedigire û dibêje:
- Ca bifikire, piştî ewqas salez e bi de û bave-xwe re bipeyivim. Ê di demen weha de pejnen seyr, pejnen wusa xweş û tevlihev li merivan radibin ku nîgara wan naye vegotine, ezbenî! Heta nuha min ne xwest ez bi wan re tekevime tekiliyen nezîk û pe sere wan beşnim. Careke tene... bele, cara peşîn dema ku min xwe gihande vir, min ji mamoste xwe î kevin re nameyek tene şand ku bi wan ragehîne... bi wan ragehîne ku ez baş im û hew. Ji bo ku bi başiya min bawer bikin, we çaxe min weneyekî xwe jî xiste ber name. Le min debar ne kir û piştî ewqas salen di ser şandina we name re ev bû cara duduyan ku ez bi mamoste xwe î kevin re ketim teküiye, le ve çare

85

bi telefon û axaftineke pir kurt. Nizanim cima... le ez tegehîştim ku ez nikanim zedetir bi wî re bipeyivim. Tene min je daxwaz kir ku ew bişîne pey de û bave min û li gor gotina me, ez

e îşev bi wan re bipeyivim. Le tew biraye min î piçûk, Xwede-
yo Dema ku ez ji wan deverina derketim, ew şerînekî çarsalî
!

bû û anuha jî Xwede dizane ketiye salen...

Denge telefone ve hevoka doste min nêvecî dihele, radibe bi
zimanekî telefonî bersiva deng dide û tavile tederdixe ku ma
moste wî ye kevin e. Piştî ku kurt û hindik li wî jî dipirse, je
daxwaz dike ku ew telefone bide bave wî. Di ve navbere de
deste xwe daveje bişkokeke teype, pelî dereke telefone jî dike
û bi dilpekîn dipe. Ew denge ji aliye din î telefone li vir li ba
me jî bilind dibe û edî ez jî dibîhizim. Dest û leven doste min
dilerizin, çaven wî di kortiken xwe de nahewin û her dilîzikin.
Li aliye din î telefone denge pilepila jineke te û dibe:

- Faro, ez bi qurbana te bim, Faro!
- Daye, tu çawa î daye, ez Faro me.
- Ez bi qurbana te û denge te bim, Faro.
- Tu çawa î, daye, tu sax û silamet î, dako?
- Ez bi qurbana saxî û silametiya te bim, Faro, denge te ke
te guhe min...

Li vir peyviken diya Faro bi kelagiriyeke diqurmiçin, sivik
dibin, wenda dibin û tene denge hîskîneke dilşewat te bihîsti-
ne. Mîna ku tîna wî dile şewutî ji heyşte hezar kîlometran bi-
gehîje vî doste min, ez dibînim be anuha di çi rewşe de ye. Ez
dibînim ku sere wî tije, deve wî tije, dile wî tije û çaven wî ti-
je ne. Diya wî bi deng digirî, leven doste min dilerizin, firni-
ken pozen wî pel didin û bi gewriyeke tijî:

- Teleforie dayne, dako... dayne ez e ji vir vekim, dibeje û
çawa ku ew jinen diltenik di ser miriyan de digirîn, ev doste

min jî wusa di ser telefone de xwar bûye û wusa digirî. Ji bo ku ew rihet bigirî ez radibim û derdikevim balkona mala wî. Dema ku derbasî hundur dibim, dibînim ku doste min ter çaven xwe guvişandine û av je vala kirine. Çaven wî sor, ruye wî geş û bi min wusa te ku di van çend hilman de tevgeren der û hundure wî jî hatine guhertin. Pîştî ku cixara xwe divemirîne bi îcaze dîsa dadide telefone û numero bi numero nezîkî di ya xwe dibe. Denge diya wî te, wan gotinen bi qasekî bere du-bare dike, direj dike, zede dike û dibe:

- Diya te bi reben be, Faro! Diya te bi pepûk be, Faro... ka te ne got, berxe min, tu çawa î kefa te?

- Tu nizanî, dako, tu nizanî be anuha çi pejn li min rabûne û ez çiqasî kefxweş im!

- Ez bi qurbana te û kefxweşiya te bim, Faro.

- Mamoste da zanîn ku bave min ne hatiye, ew çawa ye ci ma ne hatiye, Dînoye piçûk çawa ye?

- Bi qurbana sere we bim, Faro. Bave te sax weke pîvaz e. Me Dîno î biraye te zewucand. Jina wî bi zarok nexweş e.

- Maşallah, na xwe edî Dîno bûye mer! Xwede kiri be we şayiyeke bi dile wî li dar xisti be. Xwezî ez jî li wir bûyama û di dîlana wî de min jî du ling li erde bixista.

- Ez bi qurbana te û wan herdu lingen te bim, Faro! Le ew kef û şayiya ku tu dibejî edî li van deran ne maye ku! Em çûn me bedeng bûka xwe siwar kir û... me siwar kir û dîsa bedeng me hanî.

- Ax dako, tu nizanî be anuha min çiqasî beriya we û wan

deverina kiriye!

- Ez bi qurbana te û we axîna te bim, Faro. Le cima heta nu ha deng ji te dervediket? Te cima ne digot bila diya min were ser tele? Meze... anuha mirina Xwede jê li ser çavan. Min den-
87

ge te bihîst bes e.

- Min digot... dako, min ne dixwest... min bi mamoste da zanîn ku ez baş im û bila hûn mereqa min nekin. Dû re min meze kir ku nabe, min rabû je daxwaz kir ku bişîne pey we. Min dizanî bû ku di van deman de ji we hinek... ji we hinek e ji zozanan dakevin, edî wexta rezan e. Ma we dest bi rezan ne kiriye, daye?

- Me dest pe kiriye, Faroye min. Ev heye deh roj ku me dest pe kiriye. Hûn pengizîn. Me kes nîne û em pe re nagehînin, berxe min. Ji reze jorin heta nuha me tene aliye baye barîn qu-raftiye, me penc niqre şîre kelandiye û ye din jê hîn li dar e. Reze jerîn me hîn tew dest pe ne kiriye.

- Tu dizanî, dako... Anuha dema ku tu weha dipeyivî raste rast ew behna kerga me te min. Mîna ku anuha min li ber argûne niqra şîre pal dabe, tîna agire ezingen çiyaye me dide min.

- Ez bi qurbana te û tîna wî agirî bim, Faro. Rebene min, Faro! Te qala agir û argûne kerge kir... per, sibe zû dema ez çûm kerge, li kerge di ber agire tefiyayî re du xortan pal dabûne lûlen tîfingen xwe û dihenijîn. Peşîye ez tirsîyam le dû re dile min bi wan şewutî. Xort bûn. Çaven xwe vekirin, rabûn rûniştin û gotin:

"- Netirse, mete." Dû re pirs kirin ka min alîkariyeke wan dive an ne. Diya wan bi reben be!

"- Mete bi qurbana we be! Ne hewce ye hûn alîkariya min bikin, le Xwede dizane anuha hûn birçî ne." Min got û ew pel û pincara ku bi min re bû, min hanî danî bf r wan. Dema ku wan nan dixwarin, tu ketî bîra min, Fareye" min. Ji wan yek mîna te şermok bû. Dile min eşiya, hesir bi çaven min ketin û rabûm ji kerge derketim ku ji xwe re bi dile xwe nan bixwin.

88

evare re me türe pişta wan jî ji nan û pexwarine dagirt, ba
Bi

ve te hespen mala Demo hanîn, ew herdu xortana girtin newal û newal ber bi zozanan birin. Te pirsava bave xwe kir... bave te hîn venegeriyaye.

- Cima hespen mala Deriio, ma hespen me, ji Şînboza min?...

- Bi qurbana te û Şînboza te bim, Faro. Ma hesp û Şînboz hiştin! Xwede ji wan re nehele! Ka edî naye bîra min jî be kî jan sal bû, bi çend salan piştî wendabûna te û ji van deveran, rojeke ji buhara paşîn, ere buhareke ji wan salan bû, Dîno î bi raye te bi girî hat ber çîten kon û got:

"- Cendirman li ber şikeften jorîn hespen me dane ber tîfîngan û Şînboz jî ketiye." Bave te li ber dile wî da û got:

"- Xem nake, meriv ji bona mehîneke ewqasî nagirîn." Le wî her dikire kûrekûr û di nava giriye xwe de digot:

"- Mîna ku keke Faro hati be kuştin, ez pe deşim." Piştî ku bave te le hers bû û göte:

"- Careke din çelî kuştina Faro meke!" Wî jî edî qala Şîn boza te ne kir.

Mîna dîware ku kevirek je bikeve û ji heza xwe wenda bi ke, li vir gwîne doste min jî te guhertin, le beyî ku zede li xwe bide der dibe:

- Xwede dizane be anuha çi xweşmer ji Dîno derketiye. Te qala zewaca wî kir, daye, le te ne got ka bi ke re zewuciye?

- Me keça mala Şerko je re hanî, Şerkoye Seyrika bavfile.

Keçikek şîrpak e. Wek ku min got anuha jî bi zarok nexweş e û li bendî rojan e. Beriya ku Dîno î biraye te ji vir veqete bi me da zanîn ku dergûş law be, em nave te le bikin. Le edî Xwede dizane be ew e çi çebibe.

- Ka bisekine,.Dîno veqetiya çû kudere?

89

- De ka ez çi dizanim, Faroye min... nizanim, tifing, havete mile xwe û ew jî çû sere çiyar.

- Tifing ji kudere hanî, tifinga çi? Ma bave min tiştê ne gö te wî?

- Ez bi qurbana te û aqile te bim, Faro. Bi Xwede bave te ge lekî bi wî de ket û je re got. Je re got:

"- Wusa neke, jina te bi tene ye, diya te pîr û ez kal im edî.

Faro jî ne li vir e." Le wî guh neda bave te û bi ya xwe kir. Ra bû bîst kavir jî dan ber xwe û birin firotane. Dû re me dît tifingek di mile wî de û hat. Bave te le hers bû û göte:

"- Serhişkiye meke û sere me neke xezebeke." Le mîna ku tu ji kevirekî re bibejî, tew ne diket sere wî. Tifinga xwe digirt, li peşberî bave te rûdinişt û je re digot:

" Dive ez bikim, heval! Ku ez û yekî wekî min neke, ma kî e were ji me re şer bike!" Mîna ku bixwaze pe bave te hers bi ke, qondaxa tifinga xwe jî li erde dixist û.... û wek vî dengbeje mûşî bi sitran digot:

"- Ez Ferzende me û Ferzende me û Ferzende me.

Ez bave Elfesiya, siware Zinawir, xwediye Kuçikçapliye me...

- Bave min î reben! Bi tena sere xwe anuha çawa ewqas pez...

- Bi qurbana te û bave... Ma tu qala çî dikî, Faroye min, me pez nîne ku! Me pez nîne edî, bence min. Piştî çûyîna Dîno û çiyân, hukmate em gelekî eşandin, digotin: "Ka Dîno li kude re ye, bînin!" Ji bona wî bave te şilfûtazî dikirin û li wan zoman digerandin. Bave te gelekî li ber xwe diket. Di ser min de dikire pilepil û digot:

"- Van zaroken te ez rezîl kirim. Pîvanen eşîriye ne mane, pîvanen piçûk û meziniye ne mane, lawe min î naşî radibe ji 90

min re dibeje: heval. Cendirmen ku me di xewnen seven nîve şevan de jî li van deran ne dîti bûn... ew cendirmen ku li zozanan me tene ji deven dengbejan bihîsti bûn anuha ten min şilfûtazî dikin û di nava zom û reşmalen eşîre de diğêrinin. Poz û guhen min bihata jekirin çetir bû ji ve yeke." Wek ku min got pir li ber xwe diket. Dû re jî rabû hemû pezen zozanî firotin û em daketin gund.

- Na xwe we zozan berdane û hûn edî naçin?

- Ez bi qurbana te û zozanan bim, Faro. Edî xelk nikanin li

gundan bisitirin, ma em e çawa bikani bin li zozanan bimînin, berxe min!

- Be pez û beyî baye zozanan nuha bave min çi dike! Te bîra min dema em li sibehen payizen peşîn bi denge kewen zinarenen peş zoman radibûn, min didît be bave min çiqasî bextiyar e. Li bine guvîja gire Singore rûdinişt, mîna ku bixwazewan hemû behn û baye zozanan bidewusîne hundure xwe, dûrûdirej hilm vedida, ji kefxweşî vedigeriya ser min û digot:

"- Faroye min, ku ez rojêke bimirim, li bine ve dara guvîje min veşerin. Li vir meriv baştir bi mana kare Xwede dizane. Meriv dizane ku Xwede hertişt çiqasî bi mane afirandiye."

- Ez bi qurbana denge te û Xwede bim, Faro. Ma zozan maye. Hemû şewutandin, kirin rijik, kirin pîşo û berdan. Ji wan deveran anuha tene behna barut û şewate, behna xwîn û laşen virnê te. Tiştêk li wan deverina ne maye û... ne min got, anu ha jî em li gund in.

- Dako heyran, de qet nebe... ji bona Xwede ji min re hinekî qala meriven me, qala gund û şeniyan bike.

- Ez bi qurbana te û nave Xwede bim, Faro! Ma ez ji te re qala çiyê gund bikim, Faroye min. De gund günde bere ye û... le wekîdin em bibejin hertişt... ne hertişt le gelek tişt guheri-

91

ye û bi me nû ye: şîn û şayî, bext û marifet tiştêkî bere ne maye... berf û barana ku dibare jî edî ne weke bere ye, Xwede dizane be cima le îsal berf û baraneke reş dibarî. De qeye dawiya hunera Yezdane Pak hatiye. Ha... ji Faroye xwe re bibejim, Berot pir û pir behsa te dike...

- Berot î gavan?

- Ere, hîn jî peşine çeyî û başiya te dide û dibe:

"- Faro xwediye xwîneke pexemberane ye." Ve buhare şe-
veke hat mala me, ji ber piştta xwe gurozek pere derxist, dire-
jî bave te kir û got:

"- Ev peren ha Faro dabûne min. Di wexteke de min bi
deyn je xwesti bû. Hezar carî mala wî ava!" Bave te deste wî ji
xwe dûrxist û göte:

"- Bila ji te re be." Le wî li bave te vegerand û got:

"- Na, ku çend sal bere buya min e bigirta, le anuha pewîs-
tiya min ji van peran tune ye û ez jî didime te." Bave te dîsa ne
xwest bigire, le wî gotinen xwe duçar kirin û got:

"- Sikir ji Xwede re rewşa min baş e, îro ji min betir pewîs-
tiya te bi van peran heye."

- Pewîstiya wî cima ji peran tune ye, başiya rewşa gavanekî
çawa dibe?

- Ji xwe re bûye mamur, Qoriçî ye.

Li vir çaven doste min bi tirs û şikebarî mezin dibin, reng û
denge wî tene guhertin û mîna ku anuha ruye diya xwe jî li ser
numeroyen telefone bibîne, deste xwe ber bi wir direj dike û
dibeje:

- Ka bisekine, te got... qoriçî?

- Lee... de edî ew jî beminet ji xwe re pariyek nan dixwe,
ah!

- Ma ew jî nan e, dako, xwezila dîsa gavanî bikira, bi heft
92

xwezilan dîsa şeniyen gund je re nan û dan berhev bikira û bi

la wî ev kare ha nekira. Nane sîxuriye!

- Na, na... ma giliye kesekî nake ku! Bi Xwede careke bave te jî deve debance da ber simbela wî û je re got:

"- Ku tu nave xortekî bînê ser zimane xwe, ez e vî zimane te jekim û bavejim ber kûçikan!" Wî jî li bave te vegerand û göte:

"- Ma tiştêkî weha tu çawa ji min dipey? Ez naxwazim nî noga xortekî jî li kevirekî bikeve." De edî ez nizanim, Faroye min... le dibejin, ku wî û xale te î Kenyaz jî tifiing negirta ew e hukmate günde me jî bişewutanda.

- Xale min î Kenyaz?! Wî jî...

- Ez bi qurbana te xale te bim, Faro. Ere welle... tifiingek bi mile wî de jî kirine. Hukmate gotiye... gotiye ji du kesan kemptir nabe.

Ve çare mîna dîware ku yek bi yek kevir je bikeve li vir gwî-ne doste min jî divemire, diguhere û bi dengêkî beçare, bi dengêkî nîvçe dibeye:

- Tiştên weha ne tiştên henekan e, daye. Di tiştên weha de xwîn heye, kuştin heye, şewat û weranî heye. Meriv çawa... çawa Berot î gavan û xale min î Kenyaz tifiinga hukmate dave jine milên xwe! Ku bi deste hukmate bihatana kuştin ez e zede li ber wan neketama, le tirsê min ew e ku ve çare jî bi dest te xortan werin kuştin.

- Na, ez bi qurbana te û xortan bim, na... dibejin xort jî pe dizanin. Dîno î biraye te ji hevalan re gotiye. Gotiye: Ew ne meriven kuştine ne.

- Ez dibîhîsim ku edî tu jî çelî hevalan dikî, dako.

- E ez bi qurbana te û hevalan bim, ma ez çî bikim. Herkes

dibejin heval û edî ez jî wusa dibejim.

93

- Dako heyran, tu dev ji hertiştî berde. Le anuha sere ve evara payize û piştî ve axaftina me keleke wusa bi dile min ketiye ku...

- Ez bi qurbana te û we kela dile te bim, Faro.

- Ka tu nizanî be anuha çi daxwaz li min rabûye, dako!

- Bi qurbana te û daxwaza te bim, Faro.

- Daxwaza min... dako heyran, sibe evare, li ser kerge, saet li duwanzdehe şeve li ser sekûka paş mahsera me hinekî pal bide û bila bere te li bakur be. Di ber sipîndara me ya paş kerger li poze çiyaye jorin bi baldarî binere. Dû re tu e bibînî ku bi qasî se misasan di ser poze çiyere li asiman se siter berwar û di reza hev de hene. Di ser wan siteren berwar re bi qasî bilindiya xaniyekî duqat sitereke din heye, bi renekî sor î agirî ye. Heta demeke wusa hûr hûr le binere. A di we gave de ez e jî li vir çaven xwe bidim hev û wan ji te re bişînim. Dixwazim tu bi wan çaven min li we sitere bineri. Bi gotineke din wusa binere mîna ku tu di we gave de bi van çaven min li wan dineri.

- Ez bi qurbana te û wan çaven te bim, Faro. Ez bi qurbana we sitera te bim, Faro! Wek ku min ji te re got, ere me dest bi rezan kiriye le em edî bi şev naçin ser rezan ku! Em bi şev naçin ser kergan, bence min... em bi roye re derdikevin û bi roye re wenda dibin. Ma kî diwere edî karûbare rezan bi şev bike, Faroye min! Ma...

Piştî şanzdeh payizan û piştî ve axaftina bi diya xwe re mîna

ku satileke ava wan kaniyen zozanen bilind di ser vî doste min
de birije û bewext wî bike kevir, anuha di ser çogen xwe de
94

xwar bûye û bedeng, beliv rûniştîye. Di ve rûniştîne de, ku
sere wî bilind û pişta wî jî rast buya meriv e rasterast bigota
ew di seremoniya medîtasoyoneke bûdîstî de ye.

95

Wellee

Beyî ku cudayîyeke texime nava roj en Xwede, weke hertim îro
jî ez bi gaven karkirekî ji ciye kar derdikevim, bere xwe didim
aşxana sere kuçe ku li wir navrojeke bixwim. Dema ku meriv
dikevine hundure ve aşxana sere kuçe, dekorasyona hela hun
dur tavile bi merivan dide zanîn ku xwediye we ji rojhilata na-
vîn e. Hertim xortekî li dor salen bîst û pencan li ber caxe aş-
xane li ser lingan e. Bi bejneke navîn, milekî fere, porekî reş î
fîlikî, du çaven reş û pozekî berane ye. Di bine vî pozî de jî
simbeleke gir. Mijara axaftine çî dibe bila bibe le mîna ku çelî
tiştêkî pir seyr bibe, hertim matmayîneke saxikane li ser ruye
wî diyar dibe. Herdu çaven wî weke du cirnan vedibin û sipî-
çiken dora reşiken wan dibiriqin. Wekîdin jî meriv dibeje qe-
ye ji we simbela wî ya gir du kopiyan din jî hatine kişandin û
di ser çaven wî re bi eniya wî ve hatine zeliqandin. Di peyivî-
neke herî normal de jî ev herdu biruyan wî yen sitûr ber bi jer
û jor dijenin.

Ev dibe şeş meh ku ez di her rojen kar de û di demen nav-
roje de van biruyan dibînim. Le hertim jî beyî ku peyivîneke

zede bikim, weke herkesi ez jî xwaririeke dixwazim, vedikişim ber maseyeke, dixwim û carina li dora xwe dinerim. Bi dîwारे hember ve portretekî Gilgameş bala min dikeşîne û hîn di roja peşîn de ez tederdixim ku ev xorte ha asûrî ye û nave wî jî Sargon e. Le ez ve yeka ha tişteki zede pewîst nabînim ku biçim û xwe pe bidime naskirin an jî wî nas bikim. îro jî bi ve

96

tevgere

me.

Ez di dere aşxane re derbasî hundur dibim û dibînim ku Sargon li ciye xwe î hertimî ye. Ji bilî min û wî kesek di hundur de tune ye. Bi silaveke swedî diçim li peş caxe wî radiwestim û pîzzake dibejim. Le dema ku Sargon çav li min dikeve, biruyen ku edî xwendevan jî pe dizane îro betir ber bi jor ew

dikişin û bi rewşeke matmayî ji min dipirse:

- Wellee... jobbar ni pâ lördagar ocksâ?

Em bi hev re bi swedî dipeyivin. Le ez jî edî feri vî xwiye Sargon bûme. Hîn bûme ku ew di axaftina xwe û swedîyan de jî ve peyvika wellee bi kar tîne. Ne tene swedî, Xwede dizane ew bi kîjan zimanî jî bipeyive, ew e ve peyvika welle weke kîlîta deve xwe bi kar bîne. Nemaze dema ku ew pirsan dike. Loma beyî ku ez li ser ve wellee'ya wî hûr bibim, bi dengekî nizm bersiva pirsas wî bi swedî le vedigerînim û:

- Na, dibejim, em rojen şemîyan kar nakin... le îro ez xerîkî karekî xwe î arizî me.

- Wellee... karekî arizî! Çi kar e?

- Kare pirtûkeke ye, dibejim.

- Wellee... pirtûkek! Pirtûka çi ye?

- Novel in, dibejim, min ji xwe re dane hev.

Li vir mîna ku aliyekî min î veşartî bibîne, Sargon dîsa bi mereqdarî dipirse:

- Wellee... novel! Tu dinivisînî jî, ere?

- Ere, dibejim, carina tiştina li hev tînim û dinivisînim.

Ez baş dizanim ku Sargon e hîn gelek pirsên din jî ji min bi ke û herweha ew biruyen wî e jî hîn gelek çaren din ber bi jê û jor bijenin. Mîna ku bixwaze ji xwe re mijareke peyivîne peyda bike, pirsê xwe duçar dike û dibe:

- Wellee... tu dinivisînî jî! Bi kîjan zimanî?

97

-

kurdî, dibejim.

Bi

-

Wellee... bi kurdî! Ma tu kurd î?

-

Bele, ez kurd im, dibejim.

-

Wellee... tu kurdî! Ji kîjan perçeyî?

-

Ez ji hela jor im, dibejim, aliye tirkan.

-

Wellee... ji aliye tirkan! Ma tu bi tirkî jî dizanî?

-

Bele, dibejim, ez bi tirkî jî dizanim.

-

Wellee... bi tirkî jî dizanî, ere!... dibeje û mîna ku piçekî enirîna xwe jî bide xuyakirin, ve çare deste xwe jî li ba dike û bi tirkî ji min dipirse:

- Niçin bizimle tırçe qonışmıyorsûn?... dibeje û nola ku dawiya hevoka xwe ji bîra kiri be, nîvçe dihele dû re dîsa li ve hevoka xwe vedigere û didomîne.

- Wellee... niçin şimdiye qeder tırçe qonışmadın? Niçin demedin ki ben de oradan geliyorum, Hecî?

Ji ber ku Sargon heta nuha nave min nizanî bû, li vir navekî jî bi min ve dike. Le ez xwe li nezaniye datînim, mîna yekî beguneh bi ken deste xwe ber bi wî vedigirim û bi tirkî je re dibejim:

- Ne bileyim, Sargon. Türkçe bileceğini tahmin edemedim ki...

Sargon bi kefxweşî û bi tepetep hevîre di deste xwe de pan dike, di ber xwe de dike pilepil û dibe:

- Olmaz, Hecî, olmaz!.. Qonışmaq lazım. Sen bana demesen, ben seninle qonışsam... Ee... kiminle qonışacağız? Ker, çetel û tiştên pewîst ji ser caxen aşxane berhev dikim, diçim li heleke aşxane li ber maseke rûdimm û pîzzaye xwe dipem. Hîn jî ji bilî min û Sargon kesek tuneye. Bedengiya hundur bi xweşdegekî Juliana Jendo dixemile û carina jî denge telefone. Gelek wext nabuhure Sargon pîzzaye min tî-

98
ne, bi giramgîriya nasekî nû li ber min datîne û bi tirkî:

- Fermo, dibeje, hevîdar im bi te xweş be.

Ez sipasî wî dikim û ji bo ku wî bebersiv nehelim, je re di bejim:

- Wusa xuyaye roj en şemiyar zede kes nayen û kare te jî kem e.

Sargon bere xwe ber bi hela der dike, herdu desten xwe di ber xwe de vedigire û dibe:

- Kes rojen şemiyar kar nake, Hecî... Le betir ji malan dixwazin.

Ez û wî edî bi tirkî bi hev re dipeyivin, le bi tirkîyeke şikes-tî. Ji bo ku dawiya hevoken xwe bîne, ez dibînim be Sargon di keve çî dijwariyan. Ev rewşa wî bala min dikeşîne û ez pirse ke je dikim:

- Ji kîjan wexte de ye ku tu ji welet derketiyî, Sargon?

Sargon bi keservedan hedîka li peşberî min rûdine, biruyen xwe ber bi jor hildide û bi dengekî gazindok dibe:

- Ma welat maye, Hecî!... Li gor gotina diya min ez li wir, li gundekî nezîkî manastira Mar Bozos çebûme le anuha weke xewneke jî naye bîra min. Li gor gotina de û bave min, wan gelek dijwarî dîtine...

Li vir mîna ku tiştêkî nû û tirsdar hati be bîra wî, li ser sandaliya peşberî min ciye xwe jî xweş dike û bi xwiye xwe î matmayî dibeje:

- Ma tu dizanî, Hecî, do evare me li male temaşa programeke televizyone dikir. Li ser we kurdan bû. Ji ber nebaşiyen dewleta Iraqe direviyan. Kal û pîren pexwas, jin û bûken bi dergûşen şîrmij, ref bi ref bi pala çiyar keti bûn, li belekî û besûyen berfe dixistin û bilindtir dimeşiyar. Zarokekî piçûk jî di

nav refe wan merivan de dimeşiya. Kamereman bala xwe da-
99

bû ser vî piçûkî. Lawik bi bertena fîstaneke tenik û cotek şö
len qetiyayî bû. Dema lingekî xwe radikir ku ber peş bimeşe,
linge wî ye din bi çamûre ve dizeliqî û rebeno dikir ne dikir
çamûre lingen wî bernedida. Ew jî deverû dikete erde, radibû
ser xwe, bi çavekî behevî li paş xwe li berware çiyê dinerî û
dest pe dikir bi dilekî şewutî digiriya. Mîna ku daxwaza hewa-
reke bike ew li wir li berware wî çiyayî digiriya, diya min jî li
male li ber ve televizyona digiriya... Bave min jî hesiren xwe
baqij dikir. Xwede dizane tiştên weha bi sere wan de jî hati
bûn. Gerçê min bi xwe jî gelek caran bûyeren weha ji deve rî-
sipyen me bihîsti bûn. Min bihîsti bû ku ew jî weke kûrden
îro hatine kuştin, bi çolan ketine û şerpeze bûne... le ev tiştên
weha ji bûyeren dîrokî betir bi min weke çîrokan dihatin...
Ker û çetel di deste min de betal mane û ez bi baldarî guh-
dariya ve mijar û bergeha dilşewat dikim. Behneke şewae,
behneke seyr xwe digehîne min jî le di we gave de ez nikanim
tebigehîjim be çî ye. Sargon jî li peş min rûniştiye, weke şewir-
mendekî xwe li mijara rebeniya kurd sor kiriye û dipeyive.
Xwede dizane di ve gave de dîwar jî di ser de hilweşe, hay ji
xwe nabe. Li ser ve mijara dilşewat ew peyivîna xwe didomî-
ne û dibe:

- Le mixabin... mixabin îro jî lehengen çîrokan weha kurd
in, Hecî. îcar dive kurd hişe xwe bidine sere xwe, dost û dij-
mine xwe bizanin, bipeyivin, bişewirin û bi riyeke heri baştir
xwe ji van kambaxiyan bisitirînin. An ne, bi nave Gilgameş

sond dixwim ku kurd e ji rebeniya xwe nefilitin û ew e jî we ke me asûriyan belawela bibin û biçin... û do evare bave min jî wusa digot... digot, kurd merxas in le zû tene xapandine... Bi denge zengile ser deriye aşxane re mîna deziyekî xav ev peyivîna Sargon te birin, ji nişka ve radibe ser xwe "Oyy!... det 100

brinner!" dibeje û ber bi argûne aşxane dibeze. Zûzûka deriye argûn vedike, pîzzayekî şewutî je derdixe, daveje satila ave, bi lez ber bi deri û penceran diçe, ventilatore li kar dixê, bi hil-kehilk û matmayîn ji merike nûhatî re:

- Förlât!... det tar bara nâgra minuter, dibeje li paş caxe aşxane dîsa dibe tepetepa wî û hevîrekî nû pan dike.

We çaxe ez tedigehîjim ku merike nûhatî telefon kiriye, pîzzayek xwestiye û anuha jî hatiye ku bi xwe re bibe.

Heta ku ew hevîre nû pan dibe, dikeve argûn, dipije, derdikeve û merike nûhatî bi xwe re dibe jî Sargon naye ber masa min, naye ber masa min û li ser sandaliya peşberî min rûnane, rûnane û çelî mijaren dilşewat nake, çelî rebeniya kurd nake û nabeje ka dive kurd çi bikin. Ji bo ku ew duman û behna pîzzaye şewutî ji aşxane derkeve hîn jî bi vir û wir de dibeze. Xwede jî, ez jî û Sargon jî pe dizane ku şewutîna pîzzaye wî ne ji ruye min de bû, le dîsa jî piştî xwarina pîzzaye xwe ji bo ku ez dile wî hinekî xweş bikim, di rabûna xwe de diçim ber wî caxe aşxane û je re dibejim:

- Kusura bakma, Sargon, seni konuşmaya aldık... pizzen da yandı...

Biruyen Sargon dîsa ber bi jer û jor dijenin, eniya wî diqer-

miçe, weke du hesken darîn desten xwe jî ber bi min vedigire
û dibe:

- Yox, babam... ne qûsûrû... zaten insan kûrtlerin üzerinde
qomşti mi...

101

Evîneke melodramîk

gundî li pere gund, li hela rohi-

Bi nave sofî Bengî pîremerekî

lata jorîn, bi qasî şeş werîsan ji kaniye dûr, li ber dîware goris-
tane rûniştiye û eniya xwe daye taveke paşnîvroya payizî. Ca
rina sere xwe dixê ber xwe, gopale xwe di erde re dide û dike
ve ramanen kwîr. Di careke wusa de bi denge pîrejineke ji wan
ramanen xwe dibe:

- Ez dinerim ku te wekî dîkekî pîr sînge xwe daye tave, so
fî?

Beyî ku dîke pîr sere xwe rake, xwediye deng nas dike û di
ber xwe de dibe:

- Zela pîrejin, de ka tu jî were li keleka min fena mirîşkeke
pîr sînge xwe bide tave.

Kenekî hûr û pîr bi herduyan jî digire. Zela pîrejin te, bene
türe xwe şist dike, ji pişta xwe dixuşikîne xware, li ser lingan
hinekî xwe ji hev vedikişîne, li keleka sofî Bengî rûdine û bi
pilepil dibe:

- Bi nave Xwede ez ji çogan de ketim îro. Ev çi ye, gidî!

Sofî Bengî li türe we dinere û bi manedarî dibe:

- De tu jî çogen xwe bişikîne û li mala xwe rûne. Çi ye, di
vî salî de jî hîna tür li pişta te ye û tu diğeri!

- E... ez çî bikim, sofî? Min tûrek pîvaz bir günde jorîn. Ez dibim ji xwe re bi girar û şorbe didim û tem. Çî bikim? Ku min du se çaren din jî bibira, edî tera min û ve zivistane dikir. Rewşa min dest nade, ha. Lee!... ma xema te ye! Te zarok he-
102

ne, te rez û pez hene... Xwezila min bi dile te! Ca binere, tu jî li vir rûniştîyî û ji xwe re li keç û büken ser kaniye temaşe di kî. Ma xema te ye!

- Tu gunehê min dikî hustuye xwe, Zele. Xwe gunehkar ne ke!

Zele herdu desten xwe ber bi gornen hawurdor vedigire û dibe:

- Sikir ji Xwede re heta nuha jî... ez bi van hemû ruhen pî rozwer sond dixwim ku gunehkariyeke heri piçûk jî ne bûye para min. Dema ku pîvazan jî dipîvim, hertim çar penc seriyên zede didim. De ka tu li xwe mikûr were û bibeje! Bebeje be te çî gunehkarî kirine.

Bi ve gotina Zela pîrejin re tiştêkî mîna gunehkariye bi sofî Bengî ve xuya dibe, sere xwe ber bi jor radike, kesereke vedide, vedigere ser pîrejing û dibe:

- Ma xortaniya te te bîra te, Zele?

- Çawa naye bîra min? Xortanî xweş bû.

Di we navbere de çaven herdu pîran li kaniye dinerin û di binin ku keç û büken gund ave dikeşin, bi hev henekan dikin û dikenin. Pişirîneke sivik li ser leven sofî Bengî diyar dibe û di ber xwe de dibeje:

- Ma di xortaniye de dile te jî ne ket kesekî, Zele?

Zela pîrejin bi kenekî saxikane deste xwe li ba dike û dibe je:

- De edî sal li me bûn şest. Ez nizamim cima tu çelî van tiş tan dikî, le dile min ne ket kesekî, na. Ma bave min î rihmetî tew ne hişt ku! Ez çend salî bûm, Xwedeyo! Çardeh... an jî panzdeh. Ez dam Pûto û tu dizanî be ew jî bi çi rewşe mir... min ne zarok û ne jî paşmerek. Ketin ber gunehen min. An ne ma cima min e anuha türe pîvazan baveta piye xwe û gund bi 103

gund bigeriyama.

Li vir mina ku dile sofî Bengî bi Zela pîrejin bişewute, bi çavêkî dilovane li ruye qermeçî dinere, dîsa kesereke vedide, du se caran sere gopale xwe li erde dixê û dibeje:

- Ez nizamim be Xerziye küre Leto te bîra te an ne.

- Xerzî? Xerziye Leto... ere, wî... Xaltiya Leto! Çawa naye bîra min, fitîl û dezî difirotin.

- Rast e, xwediye dikaneke piçûk bûn. Dikana Xerziye lawe we bû. Anuha jî li bajar li kuça peş mizgefta kesk merik xwediye dikaneke mezin e. Le edî ne gund û ne jî gundî li ser guhe wî ye. Di wan deman de ji vir bar kirin û anuha hertişt ji bîra kiriye.

Kuxukeke bewext bi Zela pîrejin digire û dibe:

- Ere, ere... ihi ihiü... ez dizanim anuha baş te bîra min. Di sale me de bû.

- Bele, gunehkariyeke bemanê ye. Heta nuha jî min ji kese kî re ne gotiye. Le ez e anuha ji te re bibejim...

Peşiyê tirseke beyom bi laşe pîrejine digire ku sofî Bengî e

çi bibeje. Le dû re ev tirsâ dibe weke dilpekiyeke xweş, loma bi mereqdarî xwe ber bi sofî Bengî dike û guhe xwe le radigire. Sofî Bengî gotinen xwe didomîne û dibe:

- Bi xwî û tevgeren xwe, wekî Xerzî xortekî din jî di gund de tüne bû. Xortekî piçekî seyr bû. Hertim xerîkî xwe bû. Di çav herkesî de baqilekî wusa tüne bû. Bi tiliyan nîşanî hev didan û digotin: "Me jî lawekî wusa hebûya!" Dema ku bav an jî deyeke bixwesta nerindiya küre xwe bida ber poze wî, ew e bigota: "Ma tu jî law î! Ca li Xerziye küre Leto binere!" Gelek caran bave min gotinen weha didan ber poze biraye min î mezin. Xortên di hemsalen Xerzî de li wî dinerin, ji heleke ve je hers dibûn û ji heleke ve jî çavnebare wî dibûn. Ji ber ve yeke

104

biraye min î mezin careke bi xençere heta hundure male da pey wî. Diya wî weris hanî di hewşa me de havet giliye dara tüye, xiste hustuye xwe û ji bave min î rihmetî re got: "Ez e xwe di ser we de bixeniqînîm!" Wusa kir û hemû şeniyan gund hanî temaşa xwe.

Mîna ku li wan demen buhurî temaşe bike, pişirîneke sivik li ruye pîrejine peyda dibe, vedigere ser sofî Bengî û dibe:

- Wey Xwede te bihele, sofî, meze van gotinen te ez birim wan deman û anuha baş te bîra min, le ev tiştên weha çawa di bîra te de mane?

- Tu guhdar bike, ez e anuha ji te re bibejim be çawa di bîra min de mane. Rasterast sitranek e, sitraneke direj e. Di wan deman de Xerziye Leto düketiye te bû...

Xwede dizane di jiyana pîrejine de ev cara peşîn bû ku tiş

tekî weha dibihîst. Dibihîst ku dilketiyeke we jî hebûye. Bi ve hevoke re peşîye mîna ku di aveke sar de bibe, dû re ev ava ha le germ dibe, tiştên xweş di ruhe we de dilivin û bi mitûmatî ji nişka ve dibe:

- Dilketiye min?

- Ere, dilketiye te bû.

Mîna ku bixwaze careke din jî û yeke din jî û hertim ve he voka ha bibihîse, dibe:

- De tu jî ji xwe re henekan dikî, lo! Ma anuha dema van gotinan e tu ji min re dibejî?

- Ez be henek dibejim, Zele. Ez dizanim edî vegotina van gotinan jî pere nake, le dîsa jî ez dixwazim bibejim û... wusa biçim hafa Xwede.

Tiştên weke mitûmatî, tevlihevî û dilpekî li pêrejine diyar dibe, ji bo bihîstina ve arşîva kevin xwe amade dike û hinekî din jî ber bi sofî Bengî te.

105

- Belâ, dile wî keti bû te. Her cara ku ba le dihanî, dihat li ser ve kaniye, di riyên ave de li bendî te disekinî ku te bibîne. Dema ku çav li te dixist, pejnên dile wî dipekiyan û evîna wî le diazirî.

Zela pêrejin sere xwe xistiye ber xwe mîna ku li wan demen xwe binere û heyfa xwe pe bîne, di ber xwe de:

- Haya min je tûne bû, dibeye. Cima rojeke yek ne şand û ev evîna xwe bi min ne da zanîn! Di tevayiye jiyana xwe de min jî weke herkesi mizgîneke weha dipa. Le...

Sofî Bengî didomîne:

- Le... ji ber hinek astengen şeytanî, dildariya dildarekî her tim dûrûdirej dajo û dû re dikeve rewşeke serhildane, Zele. Tew ne girîng e ku te hay ji ve evîna wî hebû an ne. Bi awayekî diviya bû wî bala te bikişanda ser ve dildariya xwe. Le bi kî jan re? Ji bilî Xerzî û Xwede kesekî bi ve yeke nizanî bû.

Dile pîrejine tenik dibe û bi rewşeke xemgîn dibeje:

- Bila dismalek daniya ser riya min, bila moriyek baveta satila min.

- Na! Ji bo haydariye, riya ku keti bû sere wî ev bû: Diyîna zarokekî ku bi kerî vî kari were. A ew zaroka jî we çaxe ez bûm, Zele.

Sofî Bengî hinekî li hawurdora xwe dinere, ciye xwe xweş dike û gotinen xwe didomîne:

- A li vir, rasterast li ber vî dîwarî û weke anuha te bîra min ku ew jî li vir rûnişti bû. Li kaniye temaşe dikir. Ez jî ji nav re zan û di ve riya ha re dihatim. Bi dengekî sermest banî min kir. Ez hatim û li vir, li peş wî sekinim. Piştî ku hinekî li min nehirî, ji min re got:

"- Ku ez ji te re tişteki bibejim, tu e bikî an ne?" Min jî bi awayekî zarokane göte:

106

"- Ez e bikim."

Li gel vî ciye xewle jî Xerziye xortûxama bi tirs û dengekî nizm ji min re got:

"- Le dive kesek pe nizani be, ha!" Min pe da zanîn û göte:

"- Ez ji kesekî re nabejim." Le ji bo ku Xerzî baş ewle be, gotinen xwe duçar kirin û got:

"- Binere, Bengo! Ez ji te re dibejim, le bila di navîna min û te de bimîne. Ku ji deve te derkeve..." Ve çare min sere xwe jî ber bi jor kil kir û göte:

"- Na, ez ji deve xwe dernaxim." Xerzî bi tirs û dilpekîn ke serek veda û bi dudulî got:

"- Le ez newerim bibejim..." Min je ne pirsî ka ew cima newere bibeje. Bi tevgera zarokekî ez li peşbere wî bedeng seki nim. Le mereqdariya dile min ji ya mezinekî jî betir bû. Nola ku bixwaze tişteki ji min fam bike, Xerzî li nava çaven min nehirî û li gotinen xwe zede kir:

"- Ez ditirsim ku li devereke ji deve te derkeve û ez bihetikim." Min dîsa denge xwe ne kir û sozek ne da wî. Edî min li wî jî meze ne kir, mîna yekî ku ji anuha ve xwe gunehkar bi bîne, tene di ber xwe de min li poziken solen xwe nehirî. Le ji aliyekî ve jî ez baş pe ewle bûm ku ew e ji min re we daxwaza xwe ya veşartî bibeje. Wusa jî bû. Wî gotinen xwe domand û got:

"- Ma tu e söze bidî min ku tu e ji kesekî re nebejî?" Min sere xwe ber bi wî bilind kir û göte:

"- Ere, ez söze didim ku ez e ji kesekî re nebejim." Bi ve he voka xwe re min deste xwe li hemeliya piye xwe jî xist û göte:

"- A bi ve hemeliya ha, ez e ji kesekî re nebejim." Li vir min dît ku ew di rewşeke çawa dijwar de ye. Mîna ku daxwaza me-

107

ranî an jî dilovaniyeke ji min bike, bi heviyeke li min nehirî û got:

"- Binere, Bengo, ne ku ez bi te bawer nakim... Bi Xwede dema ku ez li te dinerim, ez dibem qeye tu biraye min î piçûk î. Le dive tu bizani bî ku ev ne karekî zarokan e. Dive ji deve te dernekeve." Min dîsa sere xwe tewand û di ber xwe de gö te:

"- Ez dizanim ku dive ji deve min dernekeve."

Nola ku ez germiya xwîna di îaşê wî de hîs bikim, reşbûna beren çaven wî û sorbûna ruye wî bibînim, min hevokê bi-hîst:

"- Ez ji Zele hez dikim!"

Li vir bi bihîstina ve hevoka derengketî re xwîneke xortanî di îaşê Zela pîrejin de diğere, dile we dipeke, du se dilopen be şerin ji çaven ximamî tene xware û di dile xwe de dibe: "Cima min çel sal bere ev tiştê ne bihîst!"

Sofî Bengî didomîne:

- Le Xerzî ewqas ji nişka ve û ewqas zûzûka ev penc peyviken xwe gotin ku bi xwe jî bi guhen xwe bawer ne kir... bawer ne kir ku wî çawa got. Ez tegehîştîm ku ev hevoka wî ji dev filitî. Bi gwînekî zer tavile li ber min geriya û got:

"- Le ez bi gorî, dive tu ji kesekî re nebejî. Dive ev pir û pir bi dizî be. Binere, ez dizanim ku tu ne wekî wan zarokan nerind î, baweriya min bi te heye û loma... loma min ji te re got. Ji bo min tu ji biraye min î piçûk jî çetir î. Bi Xwede ku ji deve te derkeve, edî... edî ji bo min mirin e. Dive ez edî biçim û rasterast xwe bikujim..."

Zela pîrejin beyî ku li sofî Bengî binere, deste xwe daveje peşa fîstane xwe, bi fişkefişk dev û poze xwe paqij dike û dîsa di dile xwe de dibeje: "Cima te şerm dikir, Xerzî? Ma tiştêkî

ewqas bi tirs bû, berane min?"

Sofî Bengî bi boca gopale xwe dilîze û dibe:

- Min didît be ev dildare reben çiqasî bi tirs e. Le ez bi xwînsarî li paş xwe zivirîm û min je re got:

"- Na, ez ji kesekî re nabejim." A di we gave de min dît ku tu jî li ser kaniye yî. Bi kulîlken gir û zer fîstaneke şînokî li te bû...

Zela pîrejin bi çaven şilekî li sofî Bengî dinere, peyva wî dibere û bi xemgînî dibeje:

- Ew fîstane min anuha jî li ber çave min e. Min pir je hez dikir. Xelke jî digotin: pir li te te.

- Bele, Xwede dizane çave Xerzî jî di we gave de bi te ket. Xwedeyo, Xerziye dildar çawa diricifî, çiqas nerihet bû! Ji wî wetre min e deve xwe ber bi kaniye vekira û biqîriyama. Tavi-le bi leven lertzok vejeriya ser min û got:

"- Li min bibore, biraye min î şîrpak. Ku te dive, dev je berde û ji bîr bike. Le ku ji deve te dernekeve..." Bi ve gotina xwe re destê xwe di berîka xwe de kir. Min jî ew hevoka wî dubare kir û göte:

"- Na, ji deve min demakeve." Xerzî ji berîka xwe şeyekî sor dencist, direjî min kir û got:

"- Bila ji nuha ve ev şeye ha xelat... ewk... bila ye te be. Min digot tu e bikevî navîna min û Zele ku bizani bim ka ew jî ji min hez dike an ne."

Çaven Zela pîrejin zîq li türe we ye. Le guhen xwe wusa da ye ser sofî Bengî ku ew guhen giran anuha beyî kemasî hertiş-

tî xweş dibihîse û di dile xwe de jî weha dibe: "Min e çawa ji te hez nekira, Xerziye min! Ma tew min hay je hebû, bence min!"

Ev xemgînî û bedengiya Zela pîrejin bala sofî Bengî dikeşe,
109

dizivire ser ve rewşa we û dibe:

- Ez dizanim be vekirina ve bûyere edî bi kerî tişteki naye, Zele. Bûyera ku di demeke de vatiniya min bû! Ji bo pekanîna ve vatiniye, Xerzî gelekî ji min lava kir û got:

"- Ku te ev kare ha bikira, te çî bixwesta min e bida te. Ez di dikane de me, ku pewîstiya te ji çî hebe, tu were ba biraye xwe û ji min re bibeje. Ne pewîst e ku tu bikirî. Ez e be pere bidime te..." Dû re deste xwe di ciye bere de kir, ve çare neynikeke piçûk û çargoşe dencist, got:

"- Viya jî bide Zele." Min şe û neynik herdu jî berdan berî ka xwe.

Mîna ku min bişîne ser mirine an jî devereke wusa, deste xwe di sere min re da û got:

"- Je re bibeje ku Xerzî ev neynika ha ji te re şandiye. Ji te hez dike."

Li vir edî Zela pîrejin bi deng digirî, sofî Bengî jî mîna ku destaneke kat bike, didomîne û dibe:

- Herweha şev û rpej Xwede dan pey hev û li hev buhurîn. Gelek caran min jî xwe da sere riya ave û li bendî te seki nim, li hawurdore kanî û bîre geriyam, bi mebesta tîbûne min ji satilen te av vexwar, le tu careke jî tirsî dile min re neda ku ez neynika çargoşe direjî te bikim û evîna dile wî rebenî ji te

re vekim, Zele.

Zela pîrejin bere xwe bi sofî Bengî de dike û di nava giriye xwe de dibe:

- De ka bibeje be tirsî te ji çî bû, sofî kurmî! Bi kemanî te dikanî bû li ciyekî xewle ji min re bigota.

- Ev ne tiştê ber bi aqilan bû. Ere, ez hinekî piçûk bûm.

Le di wî salî de edî min jî dizanî bû ku dil û dildarî çî ye, bi gotineke din min jî edî dizanî bû cima jin û mer ji bo hev ha-
110

tine afirandin. Ji ber ve yeke heta demeke direj jî, min ji Xerzî şerm kir û xwe je veşart. Le evara rojeke ez çûm dikana piçûk, piştî ku min dît dikandare me bi tene ma, min bi dengê kî nizm göte:

"- Min Zele dît. Min je re got... min got, Xerzî ev neynika çargoşe ji te re şandiye. Pir ji te hez dike."

Zela pîrejin bi hers û enirin di ser sofî Bengî de dibe:

- Te ruye xwe reş kiriye!

- Bele, piştî van gotinen xwe, ji rûreşî min rabû hedîka paçekî soravî ji berika xwe dencist, direjî wî kir û min gotinen xwe yen xere je re vekirin:

"- Zele ji min re got: Ez jî ji wî hez dikim, pir je hez dikim... loma ez vî perçe pîneye piçûk weke diyarî je re dişinim."

Zela pîrejin bi rewşeke behevî desten xwe vedigire û di ber xwe de dibe:

- De ka çî xer di van gotinan de heye?

- Bele, dikandare ku çav li pîne soravî xist, mîna ku hiş û aqil ji sere wî biçê, sar bû û bi devjihevî heta demeke jî bedeng

ma. Xwede dizane di xeyalen xwe de bi te re li newalen kwîr
û ciyen xewle digeriya. Dû re bi dilekî şa zivirî ser min, ew pî
neye ha ji dest min girt û got:

"- Ez çaven te bixwim, Bengo! Bi rastî jî tu jîr î, tu çave min
î! Bave lawikan!"

Zela pîrejin edî nikane enirîna xwe veşere, bere xwe bi he
la din ve dike û dibeje:

- Bave kûçikan!

Sofî Bengiye bave kûçikan beyî ku bitengije didomîne:

- Çi dibe bila bibe, Zele. Le wî, pîne di deste xwe de bir û
hanî, dû re bi kefxweşî mista xwe di şûşa şekire nokan de kir,
deste xwe ji wir direjî qutiya piskivitan kir, çi şekir û şerînî di
111

dikane de hebûn, deste vî dikandare comerd li ser hemûyan jî
geriya û ber bi min direj bû. Benken min ji tiştên xwarine ha-
tin dagirtin. Tegehîştîm ku li ve dunyaye pere heri giranbuha
jî bi qasî vî pîneyî, li ba dikandar ne bi nine e. Ca bifikire, 'bi
pînekî weha meriv bikani be ewqas şekir û şerîniyan bikire!
Dîsa ufînek bi Zela pîrejin dikeve û dibe:

- Li te bi jahr û xwîna kûçikan be!

- Bele, wek kûçike ku careke dev li xwîne bikeve, serî çend
rojan careke min paçek dibir û dida Xerzî, berîken xwe ji tiş-
tên xwarine tije dikir û diçûm. Ne tene tiştên xwarine, herwe
ha şûşên lampan, finden rengin, sabûnen bi behn.

Mîna ku ew hemû tiştên we deme anuha ji türe Zela pîrejin
derkevin, bi eş û tengijîn dike pilepil û dibe:

- Kurm di te keve û tu genî bibî, sofî!

- Hemû jî be pere, ango bi perçe paçekî, bi girîşekî. Xwede dizane ew hemû paç, pîne û qursiken ku min ji dikandare dil-dar re dibir, wî jî bi kef û dilekî xweş heta du se rojan bi xwe re digerland, li deveme xewle pe dilîst, behn dikir û dû re jî wek peren rûmetdar dibir di ber bişkuven balîva xwe re dide-wusand hundure we. Min ewqas paç û pîne kişandin ku! Ez baş dizanim ku we çaxe ji wan paç û pînan ew balîva wî çiqas werimiye, dibe ku carina dema ji xew şiyar bûye hustuye wî jî eşiyaye.

Dîsa pilepil bi pîrejine dikeve û dibe:

- Hustuye nerindan bişike!

Sofî Bengî nabihîse û didomîne:

- Dema ku te mer kir û tu çûy, ez jî edî ne çûm dikane. He ta ku ji min dihat, min xwe ji dikandar jî dûrdixist. Piştî ku edî hertişt diqede, ew jî diçe ber balîva xwe ya evîne, di kelek bişkuvî re, hemû paç, pîne û weslen ku te de ne, derdixe,
112

yek bi yek bi keservedan le dinere û ji nav hev dide alî. Dema ku di nava wan de ji şale meran çaven wî bi paçekî dikeve, bi şûn de divenicîqe û tavile tedigehîje. Tedigehîje ku ev hemû paçen ha rengen evîneke derewîn e. Paçekî heri piçûk jî bi deste Zela wî, bi gotineke din bi deste te ne hatiye şandine. Te digehîje ku min ew xapandiye. Min ji male, ji qutiya diya xwe, ji devernên din ev paçen ha berhev kirine û hanîne. Heta roja ku ji vir bar bikin jî, min hertim xwe je vedizî û min ne xwest em raserî hev ben. Carina ku em rastî hev jî bihatana, mîna ku tew tiştêkî weha ne bû be, wî jî çelî çîroke ne dikir. Ez bawer

im ne dixwest bi bîr bîne, an jî dixwest ku ez ji bîr bikim û hîn jî ji kesekî re nebejim.

Ev evîna melodramîk li wir te gotin û diqede. Le dibejin her dawiyek destpekek e. Ji bo Zela pîrejin jî bûyereke nû dest pe dike. Mîna ku ew dile we ji bedena we ya pîr derkeve û di na va qefesa sînge keçeke bîstsale de bi cî bibe, ji vir û weha dilpekî le radibe, dikeve gumanan û carina xwe bi xwe dibe: "Aya ew daxwaza wî £ anuha jî hebe? Ma dil ne dil e?" Le dema ku li ser pîrbûna xwe û wî difikire jî, bi tevgereke gunehkarane sere xwe li ba dike û di dile xwe de dibe: "Xwede ruhe min ji van pejnen şeytanî bisitirîne!..."

Le dû re ev pjnen şeytanî carina lingen Zela pîrejin ber bi bajer dikişine. Di her çaren weha de jî di bîra we de ye ku ri ya xwe bi kuça peşjnizgefta-kesk bixîne. Di her seredanen we ha de dibîne ku pîremerekî nola van meleyen mizgeftan serûguhe wî paqij, hustuye wî sitûr û zikmezin di dikaneke de rûniştiye. Bi heviya ku ew e dîsa bala wî bikeşe û bibe evîna wî

113

ya wexteke, Zela pîrejin kirîna tişteki dike sedem, dikeve di kane û hertim jî bi şirîteke dezî derdikeve. Le tu careke jî ru ye we nagire ku ji Xerziye dikandar re bi lev bike ku ew Zele ye. Ê piştî her seredanen weha di dile xwe î şewutî de dibe: "Anuha ez tedigehîjim be çiqasî dijwar e. Çiqasî dijwar e ku meriv ve daxwaza dile xwe bi lev bike."

114

Kubarname

Rojeke buhara paşîn, dane evare ye. Bayekî nerm bi sopa kel-boxa germa piştî nîvro ketiye û hedî hedî pel dide. Ku ne ji sansora serme be di dem û roj en weha de meriv e tew nexwaze kincen heri tenik jî li xwe bike.

Mîna ku ji tabloyeke Zorn derketi be, anuha xanimeke narin di kolaneke teng de ji taxa jorîn ber bi jera bajar dimeşe. Fîstaneke direj, tenik û sipîçolkî li bejna xwe ya sîsale peçaye. Li gor modele fîsten, ku hustukur bi qasî du tiliyen din jî ber bi jer were kişandin, ew e sere herdu pesîren we yen bilind derkevin raste. Ev pesîr di reveçûna we de di ciyen xwe de nahewin û li her aliyê dihezin. Wekîdin jî ev xanima ha xwediye du çaven gir û kildayî, eniyeke pan û vekirî, pozekî jinane, du leven sitûr û erotîk e.

Ev tevgiredana we di ve kuça teng de bala gelek dikandar û teralen li ber siya çayxanen kolane dikeşîne. Haya we bi xwe jî ji ve rewşa xwe û kesen kolane heye. Le hîn di derketina male de we biryara xwe daye ku heta jera bajar biçe.

Li jera bajar, li parka peş dibistana Herekol çaven xwe li benken binS daran diğêrine. Gelek xwendekar li parke di bine siya daran de diğêrin, dipeyivin û bi hev henekan dikin. Li he la jorîn, li keleka şirava parke, li ser benkeke xortekî bi tena sere xwe ber bi çaven we dikeve. Bi gaven jineke narin hedî hedî ber bi wî aliyê diçe, nezîkiye le dike û dibîne ku xort di ser pirtûkeke de xwar bûye. Di ve navbere de sere xort ji ber

115

radibe û çaven wî li pişirmen we dikeve. Jinik disa bi tevgereke narin ber bi heleke benke diçe û dibe:

- Hevîdar im ez mîrza nerihet nakim.

Mîrza pirtûka xwe digire, datîne heleka xwe, xwe serast di ke û:

- Na, dibeje, na... xahîş dikim.

Dilpekî, şerm û kefxweşiya xort tevlihev dibe û ev hevoka ha bi dengê lertzok ji deve wî derdikeve. Heta ku jinik li ali ye din î benke rûdine, çente xwe ji mile xwe dixuşikîne ser çoga xwe û deve wî vedike jî, ew dilpekî û şerma xwendekar li ser ruye wî ye. Jinik perçeyek kaxiz, penûs û zerfeke ji çente xwe î piçûk derdixe û dibe:

- Ez nizanim ka mîrza e bikani be alîkariya min bike an ne? Tevliheviya sere mîrza le zedetir dibe. Jineke weha were û li keleka wî rûne! Alîkariya ku je te xwestine, ew tew li ser we nafikire jî. Beyî ku bizani be be çi alîkarî ye, zûzûka dibeje:

- Çawa ez nikanim!... kerem bikin.

Jinik wan tiştên di destê xwe de direjî xort dike û bi tevgera jineke nîvçe dibe:

- Xwendin û nivisandina min tune ye, mîrza. Min e ji te tika bikira ku te ji bo min nameyek binivisanda.

Mîrza wan tiştan ji destê jinike digire, tavile nermiya du ti liyen narin hîs dike û di dile xwe de dibeje: "Heyf e ku jineke weha bi xwendin û nivisandine nizane!"

Jinika ku bi xwendin û nivisandine nizane li gotinen xwe zede dike û didomîne:

- Nameyeke wusa ye ku bi herkesi naye nivisandine. Loma ez hatim ba yekî wekî te.

Xort dîsa vedigere ser dile xwe: "Xwede dizane doznameyek e." dibeje, penûse li kaxiza ber xwe xweş dike û bi dilpekiya

vatiniya xatûneke dipe. Dipe ku xatûn e çî pe bide nivisandin.

Jinik bi çavekî erotîkane li xort dinere û dibe:

- Ne kem û ne zede, ji bona Xwede ez çî dibejim, tu binivi sîne... ez edî nikanim debar bikim.

Ji heleke ve dilpekiya li hemberî jineke weha û ji heleke ve jî naveroka ku ew e bete nivisandin, ve dilpekiya xort duqat dike.

- Fermo! Hûn kerem bikin û bibejin.

Jinik tiliyen xwe yen narin ber bi deste xort direj dike û di beje:

- Baş e, we çaxe dest pe bike û binivisîne: "Xwenga min... roniya herdu çaven min!... ma tu ewqasî ji min çûyî û van gotinan ji min re dibejî? Ew çî gotin bûn te ji min re nivisandiyê? Ê ji bîra neke ku kesekî min jî tune... weke te merekî min tune ku ji min re nameyan binivisîne. Xwendin û bersiven van hemû nameyan te jî... Ax, ku te bizani buya ez bi çî diwariyan dikim! Ez diçim xwe davejim bexte alîkariya kesen dilovan û bi wan didime xwendine, bi wan didime nivisandine.

Li vir xwendekare xort bi awuren dilovane li ruye jinike di nere û ji nişka ve dibe:

- Ez dikanim... ez dikanim ji we re hemû nameyan we jî... ez dikanim j i we re hemû tiştên we bixwînim û binivisînim, xatûnxan.

Xatûnxan dîsa bi wan awuren xwe li xort dinere û di ber xwe de dibije:

- Hezar carî mala te ava! Ez baş dizanim ku hîn gelek xerxwazen wekî te li ruye ve dunyaye mane û Xwede besewadeke weke min ji dilovaniya wan neke!

Xorte xerxwaz bi serbilindiya dilovanekî ve dunyaye mîna

117

kalîgrafekî sere penûsa xwe li ser kaxiza name çene dike û dinivisîne.

"Xwenga min, bi qasî ku ez ji nameyen te derdixim, tu ji min eşiyayî û tu bi min didî zanîn ku tu di ber min de şerm jî dikî. De ka weke xwengeke mezin tu riyekî bide ber min. Piş tî wan beyomiyan ma ez e rabim wekîdin çi bikim? Ez naxwazim wan beyomiyan dîsa yek bi yek bidim nivisandine. Le ez ji te re bibejim, peşiyê ez jî deşiyam û min jî pî şerm dikir. Le anuha edî ez nayeşim û şerm jî nakim. Bi gotineke din ez ji jiyana xwe xweş û kefxweş im. Bele, ez dikanim te serwext bikim ku anuha bi rastî jî ez yeke weha me. Le tu nikanî, xwengamin. Tu nikanî bipeyitînî ku jiyana te jiyaneke baştir e. Ma çi zû te ji bîra kir, ca bîne bîra xwe! Her mehen Xwede, te mal û mer li paş xwe dihişt û tu dihatî ba min. Her cara ku tu dihatî jî bi devereke şikiyayî, ne wusa? Carina bi serekî şikiyayî, carina bi zendekê şikiyayî û carina jî... ez van tiştan dibejim û tu jî bibeje na! Tu bibeje na û ez jî gotinan te binime bîra te. Te digot: 'Ez mîna kereke kare der û hundure male dikim. Bi şev jî heta sibe di nava nivînan de destirmaniya wî dikim. Mer jî mer buya, Xwedeyo, laşekî çilmisî û genî!...' Le anuha jî tu dikî ku ji min re bibejî jiyaneke wusa jiyaneke bi şeref e, jiyaneke çetir e. De ka bibeje ma ev jî jiyaneke ku meriv deste xwe

le dayne! Na, xwenga min, na! Xwede min ji jiyaneke weha bepar bike! Ez çetir dibînim ku bi awaye xwe bijîm: Beyî ku karen weke karen keran bikim, beyî ku di qehir û qotika jiya neke gemarî de biqepijim, beyî ku bihelim yekî genî û çilmisî li ser min bibe xwedîgotin.

"Ji xwenga xwe re bibejim: Di roja îroyîn de ez hertiştî ji gor daxwaza xwe dikim. Serqise, ez çaven xwe le diğerinim, maqûlekî li gor dile xwe dibînim û herweha dostaniyeke me ya li 118

ser lingan çedibe. Dû re jî em e ve dostaniya xwe xweş bikin, em e germ bikin, em e bi hev şa bin û hew. Ji viya jî xweştir ji yan tune, xwenga min. Bila di navîna min û te de be, ji bilî peran ev dosten ha piri caran ji min re xelatan jî tînin. Ku rojê lingen te bi mala min bikeve, tu e bi xwe jî bibînî. Bi kurtibirî, vî kare ha ez li mala xwe, di bine desthilatiya xwe de û li gor dile xwe dikim.

"Le tu rabûyî ji min re çelî şerefmendiyeke dikî û tu dibejî: 'Agire dojehe jî edî te nahewîne!' Ku dojehe û agirek hebe, we çaxê dive hinek jî hebin ku te de bişewutin.

"Hevîdar im tu xwenga xwe ya piçûk tebigehîjî û careke din jî gotinen naxoş ji bo min nebejî."

Xewnga te Kejal

"Not: Ji bo ku zimandirejiyen zede nebin, ez hatim vî bajare mezin. Min ji xwe re xaniyekî li ser du qatan kiriye û bûme xwediye navnîşaneke nû: Kuça Xabûre numero 8/A bajare Xe."

Weke wan çîroken tiştên xweş û hertim dawîya wan bi pej

nen dilpekîn diqedin, ev nama Kejal xatûne û nemaze ev hevoken dawîn jî pejneke wusa li xwendekare dibistana Herekol radike.

Piştî ku Kejal xatûn nav û navnîşana xwenga xwe jî bi xort dide nivisandine, ew we nameya bi stîleke kalîgrafiyanê di çente xwe de datîne, bi tevgereke kubar sipasiya wî dike, we ke hatina xwe ya vir dîsa hedî hedî ji xort û benka parke dûrdikeve.

Heta du rojan jî ev jinika kubar, ev name û ev navnîşana ku-
119

ça Xabûre ji hiş û sere xortê xwendekare dibistana Herekol dernakeve. Dile wî bi pejnen gunehkariyê ledide û xwe bi xwe dibe: "Rasterast ji xwe re li merêkî digeriya, merêkî li gor dile xwe, merêkî bi xwendin û nivisandine dizane. Jineke kubar û hercayî bû. Di nama xwe de gazin ji xwenga xwe dikir û nebaşiyên zewace bi lev dikir. Peşîne pey dakirina dostan dida, çelî pere û xelatan dikir..."

Jinik çî dibe bila bibe, bi çî reng û awayî dibe bila bibe, le di van du rojan de mereqdariya xort du caran ewqas qat bilind dibe. Roja sisiyan piştî dersên we rojê pejnen gunehkariyê xwe le giran dikin û tiştêkî mîna hezeke veşartî dixwaze bere wî bide kuça Xabûre. Li ser ve yeke dikeve ramanan ku li ber deriyê Kejal xatûne ew e sedemen ve çûyîna xwe bi çî şeweyî û kîjan gotinan bibeje. Ji formulasyonên bazirganiya kuçebaziyê heta peşniyaren zewacen pîrozwer gelek tiştên seyr di ser û dile wî de li hev dikevin. Le di dawîya dawîn de biryara xwe dide, peşîya peşîna xwe digehîne gulfiroşekî, tev vazoyeke xwe-

şik qevdek gülen ji bo jineke kubar dide hev, di dayîna peran de çavekî li pîvana dizdane xwe jî diğêrine û dikeve re.

Dema ku xort li kuça Xabûre li deriye numeroya 8an dixê û we jinika kubar li peş xwe dibîne, bi şermesarî sere xwe dixê ber xwe, pe dide zanîn û dibe:

- Li min biborin xatûnxan! ... îro ew nama we kete bîra min. Ez fikirîm ku kare we ye xwendin an jî nivisandine hebe. Ez dikanim ji dil...

Xatûnxana xwediye kare xwendin û nivisandine bi pişirin li xort dinere, bi dengê nizm je re tiştina bi lev dike, li gor xwiye kubariya xwe wî keremi hundure male dike û deriyan li ser xwe digirin.

Bi heviya ku xwendevanên ve çîroke min ji nigara paş deri-
120

yen ve male xelas bikin û bi xwe bizanin be anuha di hundure male de çi dibe, ez di ser vir re gav dikim.

Le dema ku xorte xwendekare dibistana Herekol ji ba ve jinika kubar û ji hundure ve male derdikeve, ji gunehkariya ku wî kiriye an jî ji bo ku çîrok li hev were, li vir destê wî li dolabeke keleka deve deri dikeve, dolab diqelibe û desteyeke name ji çavika we diherike der. A we çaxe çaven xort bi nama wî jî dikeve, nama ku beriya se rojan bi destnivîsa wî ya kalîgrafiyanê hati bû nivisandin.

121

star

Ya

Şevreşeke buhara peşîn e. Barana ku bi rojeke bere bariye, ji nav erd û kaşan niziliye ser hev, bûye laser û bi xurmexurm di newala nava gund re diherike. Ku ne ji denge ava newale be, di ve şevreşiya nîve şeve de çûçikek jî ji dareke bifire, deng e were bihîstin. Le mîna ku ve barana pîrozwer jî ruye xwe ji şeniyan badaye, ew bariye û bûye sedeme rabûna lasereke dengdar. Loma şeniyan gund pe nahesin. Pe nahesin ku leşgeran komando havetine ser gund, ji leşgeran hinekan dor li gund girtine û hinek jî ketine nav.

Ji nişka ve, ji jer û jora gund dengen seyr tene bihîstin. Gurmegurme deri û penceran, teperepa lingan, bi tirkî fermanen çerdane, bi kurdî bergerîn û gazinen lavane.

Di navîna nîv saeteke de gundî ji malan derbûne, li pere gund, li ber dîware dibistane civiyane ser hev. Hinek bi nalîn in, hinek silawatan li nave mihemedekî tînîn û banî sitara Xwede dikin, hinek jî ji tirs komandoyen şeva nîve şeve ziman le hişk bûne û bi dilen şikebar li bendî fermana kapîtane leşgerî ne.

Du projektoren mezin di desten du leşgeran de ne, li ser dîware hewşa dibistane, li peş kaniya gund rawestiyane û tîrejen wan ji jor de bera ser gundiyan didin. Li ber ronahiya projektoran tev çaven bi tirs û beloq çend seriyen rût jî dibiriqin. Kapîtanekî leşgerî bi bejnûbaleke girs û direj, bi gaven pet ber bi koma gundiyan te û bi dengê leşgerane dike qerîn:

122

- Ka muxtar kî ye, bila derkeve raste! Bila derkeve raste ku ez bejna wî bibînim!

Bi ve fermane leşgerî re çend cot çaven ku bi gavekî bere di-biriqîn, li çep û rasten xwe diziriqîn, çend serî ji ciyen xwe dilivin, ji nava wan seriyên muxtarek derdikeve û bi rewşeke reben diçe li peş kapîtane leşgerî disekine. Muxtarekî bi bejne ke kurt, çîpen zirav, serekî rût î piçûk e. Bi bertena eşofmanekî bemboyî ye û zenden piyên eşofman jî ber bi enîşka wî hilkişiyane jor. Jera wî çog dane û herweha dîmeneke bizmarekî xwar î piçûk dide. Kapîtane leşgerî li ve dîmene dinere û mîna ku bawer neke le dîsa jî bi hers dibeje:

- Tu muxtar î, ere!

Peyvikek hûr di deve muxter de dibe du perçe û bi dengekî lerizok re je derdikeve:

-Be... le...

Kapîtan hersa xwe mezintir dike û dibe:

- Ev çi muxtarî ye! Ca li bejna xwe, li derpe xwe... ca li vî sere xwe î piçûk binere! Ma ka muxtarî bi te dikeve?

Muxtar bersiva kapîtan nade, tirs û şerma van gotinan xwe digehînin hev, dibe xwedîdaneke bewext û li nazikciyên laşe wî dide der. Xwede dizane be cima, le mîna ku muxtar jî yekî ji wan be kapîtane leşgerî şîretan le dike û dibe:

- Dive tu bizanî ku muxtarî karmendî ye. Karmendiyeke dewlete ye!... Dive tu tebigêhîjî ku tu jî ji avahiya ve dewleta mezin perçeyek î. Dibe ku ev perçe perçeyekî heri piçûk be, le dîsa jî tu perçeyek î. Ê wusa diyar e ku tu perçe heri pîs î. Perçe ku zengarî bibe û bi kerî vatiniya xwe neye, edî tu jî di zanî ku meriv çi dike. A meriv wusa bi guhe wî perçeyî digire (li vir kapîtan bi herdu destan herdu guhen muxter digire, ji erde radike û didomîne) û weke bizmarekî zengarî daveje.

Bizmare zengarî bi entîn li peş kapîtane leşgerî li erde dike ve. Wek ku cin li muxter bixe, li ser erde çamur dipirpîte, le dîsa jî radibe û bi ricifîn li peşberî kapîtan di fermane de radiweste. Ji ve tevgera kapîten hiş û ruh li gundiyan te guhertin. Beyî daxwaze xwe hinek di dile xwe de: "Ku ev ji bo xatire pe-
rçekî dewlete be, kî dizane be ew e çi were sere me!" dibejin. Kapîtan ve çare jî bi fermaneke pet di ser muxter de dike qerîn û dibe:

- Anuha û di dest de... hemû gundî dive çeken xwe bînin!
Ev fermana pet, muxter hişk û ziwatir dike û nizane ku ew e ji kîjan hele re çi gotine bibeje. A di ve gave de dile wî pir dixwaze ku ev hemû beyomiyen îşevîn xewnek be, tirsexewneke seven xirab be. Bi çav û awuren vala bi qasî du hilman li ruyen gundiyan dore dinere. Le ji bilî tirs û xofeke mezin tişetekî din li ser van rüyan nabîne û ev jî pe dide zanîn ku ev ne xewn e. Ne xewn e û tew behna potînen nû jî ji kapîten dihat. Muxtar hîn di ve duduliye de ye ka be ev xewn e an rast e. A di ve gave de dengêkî kambax ji bine guhe muxter bilind dibe, çik ji ber çaven wî difire û bi qerîna fermaneke din re dîsa li erde dikeve:

- Tu çi sekiniye, ehmeq? Bibeje!... Ji wan re bibeje, bila hemû jî çeken xwe bînin!

Le muxtar edî ne ji sere xwe î rût û piçûk şerm dike, ne tirs le çedibe û ne jî van dengen kambax dibihîse. Tew eşa wan poziken potînen ku dû re li newqa wî dikevin jî hîs nake. Dema kapîtane leşgerî tedigehîje ku muxtar xewiriye, ve çare ber bi

koma gundiyan diçe. Mîna kaviren ku xwe ji ber herişen gu-
rekî birçî biparezin û nexwazin bibin para zikekî birçî, herkes
dikeve taya xwe û tirsî mirine. Di rewşeke wusa xirab de ne
lava û gotin, ne bergerin û ne jî rev pere dike. "Ya baştir ew e
124

ku meriv xwe ji xezeba dewlete bisitirîne." Ji wan gundiyan
yekî sersipî jî weha difikire, di nava koma gundiyan de rûdine.
û dixwaze bi vî awayî xwe ji ber çaven kapîten veşere, xwe bi
sitirîne. Le piri caran ev rewşen weha ji ber çaven fermanda-
ran nareve. Mîna ku dersa psikolojiye jî girti bin, ew jî bere ji
kesen weha dest pe dikan. Di nava hemûyan de kapîtan diçe di
ser vî gundiye sersipî re disekine û dibîne be ev rebene ha ça
wa diricife. Hedîka bi hustukura wî digire, radike û je re dibe
je:

- Nave te?

Diranen sersipî li ser hev direqîsin û bi dijwarî dibeje:

- Nav... Os e, qumandar.

- Tu cima rûniştî û tu cima wusa diricifî, Os?

Peyvek tomarî, peyvikek saxlem ji deve Os î sersipî derna-
keve. Bi wan gotinen nîvçe û qurmiçî pe dide zanîne ku ew ji
ber eşa çoğa xwe rûniştîye û ji ber sermaye diricife. Dû re mîna ku
bixwaze kapîtan aliye xwe î dilovan nîşan bide, bi dile
kî şewitî direjtir dike:

-Wek ku hûn jî... bi kerem dibinin, qumandar... dibeje û bi
wî zimane xwe î pelixî bi qumandar dide zanîn ku weke gele-
kan wî jî pere ne gihandiye ku kûme xwe girede û di hatine
de şekal jî ji lingen wî pengizîne.

Ev gotinen Os î sersipî li peşka kapîten te, bi ehmeqiya şa-
nogerekî tiyatroya bi dengekî bilind dikene, dû re bi mirûzekî
tirş di ser de bilintir dike qerîn û dibe:

- Zû wan kincen li xwe jî ji xwe bike!... ji xwe bike, tu e
anuha germ bibî!

Ev daxwaza fermana kapîten bi Os î sersipî û hemû gundi
yan tiştêkî bemane te. Mîna ku ji wan re bibeje: keviran bix-
win! Loma Os î sersipî bi tirs eke duqat di ciye xwe de bedeng
125

û beliv dipe ku kapîtan e hîn çî bike û çî bixwaze. Potîna ka
pîtane leşgerî ji nişka ve weke tîzika hespekî dîn radibe û li çö
ğa Os î sersipî dikeve. Çöğa wî ditevize, di bine laşe wî de na-
hewe û di cî de diqelibe. Ve çare jî herdu potînen leşgerî li er-
de xwe radikeşin Os, qerîn û hewar bi erde dikeve, asiman di-
bîhize û deste sibe dibe.

Leşger ji gund vedikişin. Kesen ku ji ber jop û potînen leş-
geran ji xwe çûne, tene berhevkin û li malen wan rast dibin.
Serçav û giyane gelek gundiyan reş û mor bûne. Li gel ewqas
jop û potînen leşgeran jî, dibejin we şeve xwîneke wusa ber-
biçav ne rijiyaye. Te gotine ku ev jî ji pisporiyek e. We şeve
gelek meren gundî heta rohilate jî ji ber eş û azara giyane xwe
nikanin rakevin û ji bo kare sibe jî ranabin. Herweha kare si-
be li ser jin û zarokan dimîne.

Zarok kare xwe dikin. Li ser riya garana dewaran li taxa kani-
ye li ber hewşa mala muxter fereke şekal bûye gû û di zarokan
geriyaye. Du zarok weke du kûçikan bi hev ve zeliqîne. Her
du serî we fera şekale ber bi hela xwe radikeşe, bi meraniyeke

zarokane xwe direjî hev dikan, li nava çaven hev dixin, di hev de gez dikan, di hev de digirîn, li hev hers dibin û dibejin: Kûçik lawe kûçikan!

Ji wan kûçikSn lawe kûçikan yek li ye din vedigerîne û di be:

- Kûçik tu î, küre kere!

Küre kere jî di bine ve gotine de namîne, xwarî kevirekî di be, li sere ye din dixê û bi dengekî berztir di ser dike qerîn û dibe:

126

- Ker tu î, lawe mange!

Xwîneke germ û sor ji eniya lawe mange te xware. Denge girî, qerîn û çeren zarokane li nav hev dikevin, weke gilokeke heta ser kaniya hember diçe û ji wir tev denge jineke bi şûnde te:

- Kero va ez e xwe bigehînim te! Ma tu taye Şemoye min î, segbav!...

Ew segbave ha jî li jinike vedigerîne û dibe:

- Segbav tu î, delik!... cima şekale ji deste min dikişine?

Min ji xwe re li erde dîtiye.

Delik weke delegureke bi lez te, çav li xwîna eniya Şemo î küre xwe dikeve, çav li sere we tarî dibin, bi hrs şekale ji dest lewik dikişine, heta ku je te we şekale li kursiya deve wî dixîne û dibe:

- Ma şekala te û bave te ye, segbav!

Qerîna tirs û eşeke ji wî segbavî derdikeve, deste xwe dave je deve xwe, tev misteke xwîn û du diranen zarokane je der-

dixe, bi hewar, bi girî bi lez serjerî male dibe û tavile tev kale-
kî bi gopal ber bi kaniye dikişine jor.

Û her weha kal jî bi gopale xwe tevî sere jinen li ser kaniye
dibe. Zarok bi tirs û girî keviren piçûk davejine hev, jin bisk û
guliyen hev dikeşin bi gotinen naxoş dar û çoyan di hev re di
kin, kale bi gopal xwe radikeşe diya Şemo di ser de dike bire
bir û dibe:

- Ca tu bise!... Ca tu bise ez çawa vî gopalî di te ve bikim,
delik.

Delik xwe ji ber gopale kalo dide alî, xwarî kevirekî dibe:

- Gopal di keç û bûka xwe ve bike, melûne xerifî! dibeje û
daveje. Mîna kevire ji kevaniya hezretî Dawûd ev kevire jini
ke jî ciye xwe dibîne û ew melûne xerifî jî mîna Calûte filistî
127

tev xwîneke li erde diqepije. Dixwaze rabe nikane, dixwaze bi
nere nabîne û li wir li erde bi eşa kalekî dinale, diqîre:

- Heware gundîno... li min-û ve delike!... Ve delike çav û
dirân bi me ve ne hişt, heware! De werin hewara min û vî se
riye beçav, heware!

Hewara kal î bi gopal digehîje nav malan û ji nav malan ji
herdu seriyên naşî û baqil ber bi kaniye direj dibin, li wir li ber
hev pan dibin, bi dar û keviran direjî hev dikan, tevir û beran
li hev bilind dikan, ker û xençeran dikeşin hev û di hev re di
kin. Ya sitar!...

128

Darînê Daryo, Darîn Îlehengê vê çîrokê daxwaza xwe Ji min re bilêv kir Li ser

vê daxwaza wîli pêş mîr Celadet Alî Bedîrxan û li hafa seydayê erd û asîman

Ahmedê Xanî min jîsoz dayê ku ez li dawîya vê çîrokê van gotinan Jîbînivîsînim

Û bibêjim "Ev çîroka ha divê bî zîmanekî din neyê xwendinê, divê her û her bî

zîmanê xwe Îmalê bîmîne"

Herweha nîvê êşa lehengê xwe min jê girt, nîvê titûna qelûna wîya dawîn min

kîşand, nîvê hêsirên wîmin Ji kaniyên çavên xwe rijandin, li nîvê textê wîyê

razanê min cîda xwe, wê şevê nîvê balîva wîmin serê xwe da ser û em bî hev

re ketin xewê

**

GIRTÎ

Firat Cewerî

NÛDEM

Çîrok / Çapa z.

Weşanên NÛDEM

Girtî

Çapa Yekem: Stockholm 1986

Çapa Duwem: Stockholm 1996

© Weşanên NÛDEM

Pergala berg û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Ghazizadeh

Fotoyê F. Cewerî: Arif Zêrevan

ISBN: 91 88592-12 x

Navnîşan

Termov. 52. 2tr.

175 77 Jarfalla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

NAVEROK

FIRAT CEWERÎ Û ÇÎROKÊN WÎ 5

LAWIKENEXWEŞ 12

ÇÎROKA MUXTÊR 16

HEMÎDOÛAVÛKAT 25

DIYAMIHO 44

XEWNANEBCER 47

GIRTÎ 49

KURMÊ DARE JI DARÊ YE 52

BÎSÎKLET 61

BOYAXKERÊ SOLAN 66

CIWANGHEYÊ TEMO 76

KEVOKADÎLAN 94

BARKÊŞÊN BIÇÛK 103

CIGAREFIROŞ 121

SERÎHILDANA ZAROKAN 132

FIRAT CEWERÎ Û ÇÎROKÊN WÎ

Di şeveke Newroza 1988'an de, li Hambûrgê xortekî Zaxoyî pirtûkên kurdî difirotin. Qalindbûn û qapaxa pirtûkekê ji wan bala min kişandibû. Ez berê jî di çend kovarên kurdî de pêrgî navê nivîskarê wê hatibûm. Piştî hat bîra min ku sê pirtûkên wî yê helbestan jî çap bûne. Min texmîn kir ku wê ev pirtûk jî helbest be, lê gava min

rahiştê û rûpelên wê di ser hev re qulipandin, min dît ku ew bi pexşanê (prose) hatibû xemilandin. Pirtûk 346 rûpel bû û hemû kurteçîrok bûn. Hema min li ser lingan destpêka çend çîrokan xwend.

Kurdiya wan ya şêrîn ez weke qilçixekî girtibûm û bi xwe re herikandibûm. Zimanê wan wek herikîna çemekî bê sekin bû. Navê wê pirtûkê "GIRTI" bû. Nivîskarê wê Firat Cewerî bû. Piştî wê şeva Newrozê bi çar salan, li Stockholmê şeva piştgiriya rojnameyê kurdî hebû. Berî ku programa şevê dest pê bike, ez û çend dostên xwe, yê ku me bi salan hevdu nedîtibûn, li ser kursiyên li pêşiya salonê rûniştibûn. Sohbata me li dar bû. Di nava wan hevalan de ciwanmêrekî

ku min ew nas nedikir, hebû. Di destpêkê de ew bêdeng bû. Di bin çavan re li der û dora xwe mêze dikir, lê guhên wî li civatê bûn. Gava gotin hat ser zimanê kurdî û weşanên kurdî li Tirkîyê, tiştê ku min nedipa, bû. Wî zîlamê ku hetanî wê çaxê tenê guhdarî dikir, bi awakî ji xwe bawer, bi kurdiyêk xweş û bi dengêkî nizim weha digot: " Wilo nabe. Divê mirov here. Gava mirov biçe li Diyarbekirê, yan jî li cihekî din kovareke kurdî derxe, wê kesên ku bi kurdî dinivîsîn, li dora wê vehewin. Em ê bi vî awayî bikaribin zimanê kurdî bi pêş bixin û ji edebiyata kurdî ya modern re bibin alîkar." Xwediyê van peyvan ji Firat Cewerî pê ve ne kesekî din bû. Pişt re ez têgihîştim ku Firat Cewerî wan rojan haziriya derxistina kovara NÛDEM'ê dikir. Lê mixabin, planên wî yê li Diyarbekir derxistina kovarê neçû serî. Di bihara wê salê de NUDEM li Swêdê derket. Bi hejmarê duwemîn re F. Cewerî xwest wê bibe Tirkîyê û wî ew hejmar li Ankarayê derxist. Lê mixabin, NUDEM piştî wê hejmarê mecbûr ma ku weke hemû pêşiyên xwe vegere surgûnê. Ew niha, her ji sê mehan carekê, di bin berpirsiyariya

F. Cewerî de li Swêdê derdikeve.

Di edebiyata kurdî ya nivîskî de pexşan pir kêr e, geşbûn û pêşketina zimanekî jî bi wê tê pîvan. Gava meriv van tiştan tîne ber çavan, qîmeta nivîskarên wek F. Cewerî û kurteçîrokên wî eşkeretir dibin. Herçê helbest in, kesên weke Mele Ehmedê Batêyî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî ji me re gelek klasîkên bi nav û deng û bi kêrhatî hiştine.

Lê pexşane? Mixabin, ji bo pexşana kurdî mirov nikare eynî tiştî bibêje. Cara pêşî kurteçîrokek Fuadê Temo bi navê "Çîrok" di sala 1913'an de, li Stembolê di kovara "Rojî Kurd" de hatiye weşandin. Bi tevayî Erebe Şemo wek pêşengê pexşana nûjen û romana kurdî tê qebûl kirin. Çiqas kêr bin jî, ji salên bîstî û vir ve gelek mînakên edebî yên pexşanê hatine afirandin.

Di van panzdeh salên dawî de gelek kurteçîrok û romanên kurdî yên modern li surgûnê hatine weşandin. Mirov dikare nivîskarên van berhemana di edebiyata kurdî de wek nivşekî nû bi nav bike. F. Cewerî jî yek ji wan e.

Osman Sebrî, yê ku digel helbestan gelek berhemên bedew dane pexşana kurdî, di hevpeyvînek bi F. Cewerî re weha dibêje: " Ezbenî, çîrok ji helbestan baştir in. Çîrok bi zimanê raste rast tê nivîsandin. Helbest ne welê ye. Vêga gelek ji xortên me çavên xwe berdane nivîsandina helbestan... divê nivîsên raste rast bêne nivîsîn."

Di vê çapa duduyan de guhertinî biçûk di "Girtî" de hatine kirin. Ji ber ku çîroka bi navê "Xewna Orhanov" di pirtûka nivîskar ya bi navê "Kevoka Spî" ku li Tirkiyê hatibû weşandin de cih girtibû, di vê çapa Girtî de ew tune ye. Jê pê ve ji ber pîrbûna rûpelên pirtûkê, nivîskêr "Zoro Axa" jî jê derxistiye. Lê ji berdêla wan çîroka "Barkêşên Biçûk" ya ku di sala 1983'an de mîna du beşan di

kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Hêvî de hatibû weşandin, li vê çapê zêde bûye.

Wek ku nivîskar di pêşgotina çapa yekemîn de, 1986, diyar dike, ku kurteçîrokên vê pirtûkê di navbera salên 80-84'an de hatine nivîsandin û piraniya wan di kovarên kurdan yê wan salan de hatine weşandin. Hin ji wan di radyoyan de hatine xwendin, grûbên tiyatroyê li ser hinan ji wan xebitî ne, hinin ji wan jî bi alîkariya mamosta Şukur Mustafa bi tîpên erebî di kovarên kurdî yê Iraqê, mîna Beyan û Karwan de derketine, çend heb ji wan jî bi swêdî di kovarên swêdiyan de hatine weşandin. Niha jî, li Almanya, rohilatnasek alman wan werdigerîne almanî û wek pirtûk ji çapê re amade dike.

Nivîskar di van çîrokên de bi awakî realîzma civakî, bi piranî jiyana zarokên kurdan aniye ziman. Qehremanên wî tîpên realîst in.

Navên van zarokên ku em di kurteçîrokên de pêrgî wan tên Ferzend, Ibo, Kotan, Osman, Bozan, Çeto, Temo, Nûjîn, Gurî û hwd. Ew carna nexweş in, di nava nivînan de ne, dê û bavên wan nikarin wan bibin ser bijîşkan, ew carna boyaxkerên solan in, ku ji ber çawîşên belediyê direvin û dikevin ber tirimpêlan, ew carna barkêş in, carna li bajarên mezin cigarefiroşên cigarên biyanî ne, cama jî ew li Kurdistanê pêşengên serîhildanan in.

Nivîskar wan zarokên ku li welêt bê maf, poz bi lîçik, çav bi şelêq û çîm tazî ne, dide xeberdan û wan û mezinan dixê dialogê. Cewerî bi hostayetiyeke mezin fikir û hîsên zarokan radixe ber çavên xwendevanên

xwe. Ew mirov bi xwe re dibe dinya zarokan ya taybetî.

Lê ew bi vê jî namîne; ew rewşa welatê wan û feqîrî û neçariya dê û bavên wan jî bi tehrekî edebî vedibêje. Bê ku ew gotina xwe di nav sloganên siyasî de bifetisîne, bi bûyeran re riya çareserkirina pirsgerêkên

jiyana qehremanên xwe jî diyar dike. Wî ev tişt di kurteçîrokên "Ciwangeyê Temo" û "Serîhildana Zarokan" de bi awakî pir eşkere daye xuyakirin.

Hevaleke min a ku "Girtî" xwendibû û pir jê hez kiribû weha digot: "Firat Cewerî di piraniya kurteçîrokên xwe de bê ku têkeve nav polîtîkayê, bê ku ew hewl bide ku dilê kesekî bi xwe bişewitîne, ew jiyana kurdan, rabûn û rûniştina wan nîşanî xwendevanên xwe dide."

Kurdiya kurteçîrokan pir paqij e. Wek ku Şahînê Bekirê Soreklî jî diyar dike: " Zimanê ku Cewerî di çîrokên xwe de bi kar tîne, zimanekî zelal û hêsan e." Nivîskar di vegotina xwe de nalukume. Ji ber ku bûyerên wan jiyana kurdan ya rojane ne, tu qalibên zimanê biyanî di wan de tune ne. Bê kesên der û dora Nisêbînê çawa dipeyivin, nivîskar qehremanên xwe bi wî awayî dane xebirdan. Di cihên ku nivîskar hewceyî peyivin din bûye, ew ji zaravayên kurdî yên din girtine û bi hostayî bikar anîne. Ez bawer im dê di pêşerojê de, gelek ji van çîrokan ji mamosteyên ziman û edebiyata kurdî re bibin materialên dersê. Ne bê sedem e ku rohilatnasa alman Petra WURZEL di pirtûka xwe ya dersên kurdî ya bi navê "Kurdisch in 15 Lektionen" de kurteçîrokek Firat Cewerî a bi navê "Lawikê Nexweş" çap kiriye.

Bê şik divê mirov rewşa wan salên ku ev kurteçîrok hatine nivîsandin jî bide ber çavan. Gava di sala 1986'an de "Girtî" li Swêd çap bû, weşanên kurdî qels bûn, nivîskar kêr bûn, xwendevan çî bigirin tune bûn, îmkanên berhemên bi kurdî bi sînor bûn. Nivîskar ew bi îmkanên xwe yên şexsî, lê bi çapeke bedew dabû çapkirin. Firat Cewerî bi xwe dibêje ku ew "di sala 1959'an an jî di sala 1960'ê de, li gundekî Dêrika Çiyayê Mazî, li beriya Mêrdînê" hatiye

dinyayê. Di zarokti û xortaniya wî de sê tişt hene ku qet pêxîla wî bernadin: Feqîrî, tadeya dewletê û derketina pêşî ji gund û bajêr û dû re jî ji welêt, ango xerîbî. Gava mala wan ji gund bar dike û diçe Wêranşar, Firatê biçûk sê salî ye. Li Wêranşar rewşa malbatê a aborî nebaş e. Piştî salên 1960'î li gundê wan reforma erd çêdibe. Malbata Firat jî vedigerin gund. Li gund perçak erd para wan jî dikeve.

Firat di dibistana gund de pêrgî kirinên karbidestên biyanî tê: " Di dibistanê de ji bo her gotineke kurdî me cezayên peran dida. Heta car caran em newêrîbûn li malê jî bi hev re bi kurdî bipeyiviyana."

Rojekê jî ew dibîne bê çawa leşkerên tirk digirin ser gundê wan û hemû zilamên gund li meydana gund kom dikin û li wan dixin.

Nemaze gava ew di cama pencerê re dibîne ku Apê Hecî lêxistinê dixwe, Firatê biçûk hêrs dibe. "Apê Hecî li gund pir bi qîmet bû.

Biçûk û mezinan xatirê wî digirtin. Gava ew danên êvaran diçû ber siya dîwêr, hemû kes ji ber wî radibûn." Firat bi zaroktiya xwe ji xwe dipirse, ka gelo leşker nizanin ku ew Heciyê rîspî "Ewqasî di nava gund de bi qîmet û xwedîxatir e."

Piştî salan nivîskar Firat Cewerî hîsên xwe yên wê rojê weha tîne ziman. " Ez çiqas fikirîbûm, min tu sedem ji wê zilma wan re nedîtibû.

Lê kîn, nefret û girekî ecêb di dilê min de çêbûbû. DiJê min ji ber van hê jî diperpîte."

Di salên heftêyî de malbata Firat diçe li Nisêbînê bi cih û war dibe.

Kêfa Firat pir ji Nisêbînê re tê. "Hebûna trêne, nêzîkbûna Qamîşlokê, herikîna çemekî mezin di nava bajêr de û darên li sûka wê çikandî" Firat zû hogirî xwe dikin. Ew li wir li gel xwendina dibistanê, carna di çayxana bavê xwe de kar dike, carnan jî di firnan de nanpêjîyê dike.

Di sala 1974'an de Firatê nûgihîştî ji bo xebatê diçe roavayê Tirkiyê.

Ew li bajarên wek Izmîr û Manîsayê dimîne. Pişti salan ew ê ecêbmayî bimîne ku "nêrîna kurdayetî û welathezî li wan bajarên pê re çê dibe."

Wê demê xwenasîn li welatê Firat belav dibe, tevgera rizgarîxwaziyê geş dibe. Firat Cewerî jî vedigere welêt û tevî wê dibe. Di sala 1980'ê de terka welêt, dike, di ser Sûriyê re diçe Almanya û ji wir jî xwe davêje "Welatê sar, yê ku ji salê carekê roj lê naçe ava, Swêdê." Jê pê ve jiyana surgûnê ji bo Firat Cewerî dest pê dike. Lê ew li wir bi jîrî û bi enerjîyek pir mezin hemû dijiwariyên jiyana xwe ji bo nivîskariya xwe dike çavkanî; ew serpêhatiyên zaroktiya xwe di berhemên

xwe yê edebî de baş bi kar tîne. Ew di salên pêşî yê surgûnê de bi pereyên ku bi "Ked û xwêdana eniya xwe" qezenc dike pirtûkên xwe dide çapkirin. Lê ew li surgûnê jî ji kurdan bi dûr nakeve. Mirov carnên Firat Cewerî di nav rûpelên kovar û rojnameyên kurdî de li mala Apê Osman Sebrî, carnên li mala Celadet Bedirxan bi Rewşen Xanim re, carnên jî li ba Apê Mûsa Anter rûniştiye û pê re çayê vedixwe, dibîne.

Firat Cewerî li welêt dest bi nivîsandinê kiriye. Di sala 1979'an de, wî zilma dewletê ya wê demê, di gotareke bi tirkî de li ser navê komela ku ew di komîta wê ya karger de bû, di rojnameyekê de diweşîne. Jê pê ve wî hew bi tirkî nivîsand. Diyar e ku di destpêkê de Cewerî di bin tesîra Cegerxwîn de maye: "Di sala 1977'an de pirtûkeke helbestan ya Cegerxwîn ketibû destê min. Wê pirtûkê dilê min şa kiribû, hêvî dabû min, zimanê min bi min şêrîn kiribû. Ew pirtûka Cegerxwîn bû sedema nivîsandina min ya bi kurdî."

Firat Cewerî jî bi helbestan dest bi nivîskariyê dike, lê her ku diçe ew bêtir meyla xwe davêje ser kurteçîrokan. Ji "Girtî" pê ve, di sala

1992'an de pirtûkeke wî ya din "Kevoka Spî" li Ankarayê derdikeve. Di kurteçîrokên vê pirtûkê de, nivîskar li ser jiyana, fikir û hîsên ronakbîrên kurd yê li surgûnê radiweste. Di gelek ji wan de dijîtiyên di jiyana wan de derdixe pêş, Di cihnan de jî nivîskar bi tinazî rexnan li wan digire.

Firat Cewerî bi van herdu pirtûkên xwe îsbat kir ku zimanê kurdî di warê pexşanê de baş dikare bête bi kar anîn.

Karê ku Firat Cewerî û nivîskarên din yê kurd dikin, ne hêsan e. Ji aliyê diravî ve ew her tim di xisarê de ne. Lê jana wan ya mezintirîn xela xwendevanên kurdî û tunebûna rexnegirên edebiyata kurdî ye. Jê pê ve rewşa welêt ya kambax wan tim tine ser sînorê polîtîkayê. U ev pirsên jêrîn hîna jî di rojeva rewşenbîr û nivîskarên kurd de

10

ne, ew li hêviya munaqêşekirinek bi dostanî ne: " Çawa meriv dikare mesajeke civakî, çandî, siyasî têxe nav qalib û kirasê edebiyatê?... Çawa meriv dikare jan û eziyeta ku kurd ji mêj ve ye dikişîne, bi awayên edebî û bi stîl û estetîkên bedew, stîlîze bike û rengê nû bidiyê?"(M. Uzun)

Nivîskarê Alman yê bi nav û deng Hermann Hesse kesên nivîskar dişibîne saetê. Di nameyek xwe de, ya ku wî di sala 1931'ê de ji hevlekî xwe yê komunîst re nivîsandibû, weha dibêje: " Bivir her bivir e, mirov dikare bi wî yan daran biqelêşe, yan jî seriyan... Lê saetek yan jî barometrek bi kêrî tiştin din tên. Ku mirov bixwaze bi wan dar û seriyan biqelêşe, bê ku kesek ji wan tu fêdê bibîne ew ê xera bibin."

Ez bawer im ku peyvên H. Hesse ji her kesê bêtir ji bo kurdan xwedî maneyên girîng in. Kurdan gelek caran ji ber tunebûna saetan karên xwe bêwext kirine. Ku ew bivir û saetên xwe tevî hev

nekin, ew ê her du jî bêtir bi kêrî wan bên.

Husên Dûzen

Almanya 1993

ii

LAWIKÊNEXWEŞ

Gava ketin nava nivînan, dîsan dengê giriyê lêwik hat. Diya wî zû ji nava nivînên xwe rabû û pêsîra xwe xiste dêv. Lê, lawik bi pêsîrê jî aş nebû, wî qet devê xwe neda pêsîrê. Ew wisan digiriya, ku carina lal dibû. Jinikê lihêfa mêrê xwe ji ser ruyê wî avêt û bi ser de qîriya: De rabe ha! Qe tu rabe awayekî ji vî lawikê re çêbike! Qe rabe xwe biavêje camêrna! Ev lawik mir!. . .

Mêrik vê carê erza jina xwe neşikand, zû ji nava nivînan rabû ser xwe û hebekî lampe bilind kir. Paşê cigareke qalind pêça, vexist û li ber serê lêwik rûnişt. Dû re wî destên xwe dirêjî lêwik kir, ji jinekê stand, bir ber lampê û lê nihêrî. Rûyê lêwik zer bûbû. Gava ew digiriya, weke darekî hişk dibû. Lê giriyê wî ê îşev ne weke giriyê tu şevan bû. Ji giriyê her roj û her şev cihê bû.

Dilê mêrik bi rewşa wî şewitî û bê hemdî wî çend dilop hêsir ji çavên wî hatin. Hêsirên ku ji çavên wî hatin, di ser riwê wî yê nekurkirî de herikîn ser simbêlê wî yê gur û qalind. Ji roja ku wî bîr biribû, ew tu caran negiriya bû. Ji xwe li ba wî girî ji peyan re şerm bû, girî karê jinan bû. Lê ew di wê deqîqê de têgihîşt ku peya jî dikanin bigirîn û dilê peyan jî dikane biêşe.

Jina wî, ya ku ji kerban û ji girî nikanîbû di cihê xwe de rawestiya, ber bi wî çû û bi stûxwarî jê re got:

Ma tu dibêjî em çawan bikin, lo? Em çi awayî ji vî lawikê re çêbikin?

Mêrik serê xwe vir de û wir de hejand û bi keser got:

Ez nizanim!

Îcar jinik bi dengekî bilind giriya û got:

Ma tu nizanibî kî ê bizanibe? Ma ez ê bi vê pepûkiya xwe bizanibim?

12

Mêrik tu bersiv neda, mîna zarokan kire îskînî û bi pişta destê xwe hêsirên xwe pakij kir. Ji bo ku ew giriye xwe rawestîne, wî cigareke din vexist. Lê giriye wî ranewestiya. Wî çend caran diranên xwe qiriçandin û bi pistînî tiştin got. Hersê jî digiriyan, lê ye mêrik tenê hêsir ji çavên wî dihatin. Dengê giriye wî mîna ye jina wî û ye lawê wî nedihat. Piştî ku wî cigara xwe kişand, got:

- Mîratê niha gund bûya, min ê biçûya xwe biavêta camêrna, qe çawa ba me ê tiştek bikira. Lê bajar e, ka ez ê xwe biavêjim kê, ha? Ez ê çi bikim?

Bîskeke deng ji herduyan hate birîn. Lê lawikê nexweş her digiriya. Carna ji nişkê ve qîrîn pê diket û li ser piştê lal dima.

Şev dereng bûbû. Saet bûbû sisê-çarê şevê. Donê ku di lampa wan de mabû dawî hat. Lampê sê-car caran kire pitepit û agir bi fitîlê ket. Piştî kurtedemekê lampe vemirî û hundurê odê bi carekê ve tarî bû. Gava lampe vemirî, mêrik rabû ser xwe û çû derî vekir, da ew bi şewqa ronahiya derve, hebekî hundur rohnî bike. Barana ku dihat xurttir dibû. Ewr ji jor de weke zîhayekî ber bi rojava de dikişiya. Giregir û şîrçeşîrqa asmanan qidûmê mirovan dişikand. Ji xwe her cara ku ewran birûsk vedida, weke şîşeke sor li dilê mêrik bikeve, çavên wî sor dibûn û tirsî mirinê dikete dilê wî.

Mêrik dîsan derî girt û bi destpelînkê li hestê xwe geriya. Wî hestê xwe li ber nivînê xwe dît û vexist. Jina wî lawik di dest de bû û xwe li quncika xênî kiribû qomik. Lawikê nexweş her digiriya. Ew çend rojên wî bûn ku wî pêşîr nexistibû devê xwe. Carna ku diya wî bixwesta pêşîrê têxe dêv, qîrîn pê diket, digiriya û li ser piştê lal

dima.

Gava mêrik di bin şewqa ronahiya heste de, jina xwe û lawê xwe di wê rewşê de dît, mîna ku agir têkeve dilê wî, dîsan ji kerban hêsir ji çavên wî hatin. Dû re ew daqûl bû û bi heste sobe dada. Ji xwe êzingên wan ên ku mabûn hew ew bûri. Wan du roj berê ew êzing xistibûn sobê û li benda rojêke pir sar û dijwar sekinî bûn. Sar û seqema herî dijwar hîn mabû, Jê ji ber ku don di lampê de nema û

13

hundur tarî bû, mêrik xwest ku bi dadana sobê hebekî hundur rohnî bike. Wî deriyê sobê jî vekirî hişt, da ku bi şewqa agirê sobê hundur hebekî rohnî bibe.

Di wê bîstikê de hundur piçekî germ û rohnî bû. Şewqa agirê sobê li dîwêr mîna hêlkanê dihejiya. Mêrik ber bi jina xwe çû, li ser tûtikan rûnişt, lawik ji destên wê girt û bi dilşewatî lê nihêrî. Spîkên çavên lêwik zer bûbûn, çavên wî carina fireh dibûn û dihatin girtin. Wer ku ew giriya bû, dengê wî ketibû. Mêrik serê xwe hejand û got:

- Welleh ev lawik wê bimire, xelasiya wî tune ye! . . .

Jina wî peyva wî birî:

- Qe bila devê te ji xêrê vegere, çi ye tu qala mirina lêwik dikî!

Mêrik tişt negot, lawik da destên jinikê, rabû ser xwe û cigara xwe bi agirê sobê vexist. Piştî ku wî çend hilmên baş li cigarê xistin, ew li jina xwe zîvirî û got:

- Ez ê rabim herim mala cîranê me Seydo, hin êzing û don deyn bikim. Ger ev soba me biqede em ê perîşan bibin.

Jinikê bi dengekî nîvgirî got:

- Tu dizanî, ku te bivê, here.

Her ku diçû şîrqîn û gire-gira ewr zêdetir dibû. Dengê xuşîna baranê

mîna dengê xuşîna çemekî ji derve dihat. Hîn ew wilo bi hev re dipeyvîn, dilopek li ser serê mêrik ket. Mêrik pêşî bawer nekir ku ew dilop e. Piştî ku wî destê xwe da serê xwe, ew têgihîş ku bi rastî jî xanî dilopan dike. Di hundurê demeke kurt de dilopên xênî zêdetir bûn. Jin û mêr bi lez firaxên ku hebûn danîne ber dilopan, lê firaxên wan têra hemû dilopan nekirin, pir dilop bê firax man. Mêrik kevneqapûtekî leşkeran avête nava milên xwe û ji jina xwe re got:

- Ez herim bê ez hinek don deyn nakim. Ger dinya li me rohnî bibe, dibe ku Xwedê riyekê nîşanî me bide.

Piştî ku jinikê kesereke kûr kişand, got:

- Welleh nakeve serê min ku tu kes vê şevê li te derî vekin, lê dî-
H

san jî here, dibe ku camêr xwedîwijdan derkevin. Ez ê jî herim ser xênî, du gunduran lê xim û hinek ka lê bireşînim. Dibe ku hebekî dilopên xênî bisekinin.

Baş e, mêrik bi derd got û derkete der.

Piştî ku mêrik ji hundur derket, jinikê lawik di nava lihêfekê de pêça, kevnikek avête nava milên xwe û derket derve. Baran hîn xurttir bûbû, mirov digot qey bi kwîzan tê. Ji ba û baranê mirov nikanîbû çavên xwe vekira. Jinikê di dilê xwe de got: " Ger wilo be ne mimkun e ez bikaribim xênî gundor bikim". Wê bi wî awayî teneka kayê xiste destê xwe yê rastê û bi mêrdewanê ve bi jor ket. Çaxa ku wê gava xwe avête ser xênî, kevirê bin lingê wê şemitî û jinik ji jor de mîna gomeyekî li ser dika çimento, ya li ber devê derî li erdê ket. Serê wê ji hev belav bû, ew bû meyt û li erdê ma.

Piştî deh-panzdeh deqîqan, mêrik bi çend qutik dar û bi şûşeyek don vegeriya û di deriyê paşiya xênî de kete hundur. Gava ew kete

hundur, wî zû qapûtê xwe yê ku ji baranê şil bûbû, ji xwe kir, hestê xwe ji bêrîka xwe derxist û vêxist.

Ji dengê dilopan pê ve tu deng ji hundur nedihat. Mêrik şaş û ecêbmayî ma. Wî hestê xwe yê vêketî xiste destê çepê û ber bi lihêfa lawê xwe ve çû. Dît ku lawik bêdeng, li wê erdê, di nava lihêfê de dirêjkirî ye. Wî pêşî di dilê xwe de got: "Ox, va ye bîskê xew ketiye çavan" dû re mîna ku tişteke niqutî dilê wî, hêdî ji bo ku lêwik şiyar neke, lihêfa lêwik ji ser çavan hilanî. Lêwik qet xwe tev nelivand, weke darekî hişk li wê erdê dirêjkirî ma. Mêrik hema rahiştê û bi qêrîn bang jina xwe kir. Gava tu deng ji derve nehat, mêrik digel lêwik baz da derve û dîsan bi qêrîn bang kir:

- Xatêê. . . Xatêêê. . .Malşewitiyê lêwik can dayeee!. . .

Hîn peyva wî di devê wî de bû şîrqînek ji ewr hat û birûskê veda.

Bi vedena birûskê re, çavên wî li jina wî û li xwîna li ser wê ket. Hema bi carekê ve qîrînek jê hat û xwe tevî lêwik avêt ser wê.

15

ÇÎROKA MUXTÊR

Gava zarokên ku li dora gund dileyistin çav li kamyonên leşkeran ketin, ber bi malên xwe ve baz dan û bi qêrîn bang kirin:

-Eskerhatiiin!... Eskerhatiiin!... Eskeer...

Dengê zarokan li gund li hev vegeyriyan. Bi dengên wan re hemû gundî derketin ber deriyên xwe û li riyên nihêrîn. Gava ew çav li kamyonên leşkeran ketin, bi diltirsî û bê hêvî dîsan hemû bi paş de ketin hundur.Şeş kamyon tijî leşker ketin gund. Wan kamyonên xwe li jêrî gund, li ba dibistanê sekinandin û weke kuliyan xwe jê avêtin xwarê. Dû re çawîş mîkrofon xiste destên xwe û bang kin Mileeet, kes ji hunduran dernekevin! Yê ku ji hundurê xwe derkevin û bazdin, ew ê bêne kuştiniin!... Kes ji hunduran dernekeviin!...

Bi banga wî re xortek ji gund derket û baz da. Leşkeran li wî reşandin. Mîna mirov xwê biavêje êgir dengê teqîna tivingên leşkeran dihatin. Di wê deqîqê de mirov digot qey bûye ceng. Lê ew xort qet bê qidûm neket û nesekinî. Wî her reva xwe domand. Bi vizînê gulle di ber guhên wî re derbas dibûn. Gulle geh li tehtên ber wî diketin, perçek ji tehtê direvandin, geh di ber serê wî re dikirin vingînê û derbas dibûn. Wî hê bêtir gavên xwe ramedan û xurttir bazda. Piştî kêlîkekê kete çiyê û ji ber çavên leşkeran winda bû. Gund di quntara çiyê de bû. Çiya bi her awayê xwe ve asê bû. Kevir, gome, teht, dar, mar, dûpişk, kêzik, kurmik; hema çî li wî çiyayî hebûna, hemû dost bûn. Ew pir mêvanperwer bûn. Wan tu caran mêvanên xwe nedidan dest. Wan mêvanên xwe fedîkar dernedixistin.

Lawik hebekî bi çiyê ve bi jor ket, xwe avête şikeftê û winda bû. Edî çar pênc kamyon tijî leşker, hezar helîkopter û balafir jî bihatana hew ew beşer didîtin. Çiyê tu caran ew beşer nedida dest wan. Çiya dost bû. Çiya ne weke wan xayin û bêbext bû. Leş-

16
keran bi xwe bi vê dizanîbûn. Ji ber vê yekê ew bi paş de li gund veşeriyên. Li gund ji leşkeran pê ve tu kes nedihatîn xuyakirin. Kûçik çend caran bi dengên tivingên wan reya bûn, lê dû re ew jî winda bûbûn. Zarokên ku berî niha bi panzdeh deqîqan li dora gund dileyistin, ji tirsê her yekê xwe di cihekê de veşartibûn. Kal, jin û mêr dil bi tirs, di hundurên xwe de difikirîn.

Leşker ketin nava gund û her yek çû ser xaniyekê. Dû re çawîş û çend leşker çûn mala muxtêr.

Muxtar jî weke hemû gundiyan di hundur de dil bi tirs rawestiya bû. Gava çawîş û leşker ketin hundur, muxtar ji cihê xwe rabû û

cih da wan. Çawîş ber bi wî çû, xwe avêt milên wî, ew ber bi xwe ve kişand û bi hêz çoka xwe li gunê wî xist. Bi lêxistina çawîş re, axînek bi muxtêr ket, destên xwe avêtin nava çîmên xwe û xwe guvaşt ser hev. Îcar çawîş çoka xwe li ser çavên wî xist. Muxtar li ser piştê li erdê ket. Jina wî û zarokên wî xwestin xwe biavêjin ser wî, lê leşkeran nehiştin û bi pehînan ew dane alî. Dû re bi emrê çawîş, leşkeran bi milê muxtêr girtin, ew derxistin der, birin meydana gund û ew bi kindirê, bi darê ve girê dan. Gava leşkeran girêka dawî li kindirê xistin, çawîş pehînek li zikê wî xist û got:

- Tu ê tivingên gund bidî hev an na?

Muxtêr bi dengekî nîvqurmiçî bersiv da:

- Min ji hemû gundiyan pirsî ye, tu tiving li gund nema ye.

Çawîş çend gurmist û pehînen din jî li zikê wî xistin û bi ser de qîriya:

- Tu ê sîlahên gund bidî hev an na?

Muxtêr îcar nikanîbû bipeyiviya. Ew du-sê caran li ser hev kuxuya û vereşiya. Lê hemû verşiya wî bi ser wî de hat.

Çawîş tifikir ser çavên wî û got:

- Wisa bi ser xwe de vereşe kero! Divê tu sîlahên gund bidî hev.

An na tu ê wilo bi darê ve hişk bibî!

Muxtêr tu tişt negot, verşiya dawî ku ji devê wî hat, wek verşiya

17

zarokên çelînê bû, bi ser lêva wî de herikî.

Çawîş ber bi wî çû, hişk bi porê wî girt, serê wî hejand û got:

- Tu ê sîlahên gund bidî hev an na?

Gava muxtêr got: "Tu sîlah li gund nemane", çawîş çend şîmaqên bi hêz li ser çavên wî xist û dîsan bi ser de qîriya:

- Tu sîlah li gund nemane ha! . . .

Di demeke kurt de, hemû zilamên gund bi qundaxên tivingan û bi qamçiyên li qada gund hatine civandin. Leşkeran bi lêdanê ew kirine rêz. Piştî ku her yekî çend qamçiyên baş li wan xistin, dû re çawîş bi tiliya xwe muxtarê ku bi darê ve girêdayî bû, nîşanî wan da û bi hêrs bi ser wan de qîriya:

- Hûn vî kûçikê ku bi darê ve girêdayî ye, dibînin, ne wilo? Ger hûn sîlahên xwe neynin teslîm nekin, ez ê we hemûyan têxim vê rewşê û hê jî jê xerabtir.

- Sîlahên me yê ku hebûn me teslîm kirine, tu sîlah li gund nemane! Ev deng ji nava rêza gundiyan hat. Dengê zilamekî kal û bi rih bû.

Çawîş bi wî dengî re li gundiyan zîvirî û bi hêrs got:

- Ew ê ku peyivî bila derkeve vir.

Bi destê xwe cih nîşan da.

Gava kes ji nava rêza gundiyan derneket, çawîş ji hêrsan bû weke dêhnan. Wî emrê lêdana gundiyan da leşkeran. Leşkeran bi pehînan û bi qundaxên tivingên xwe gundî ji wê rewşê derxistin xistin rewşeke din. Dîsan bi emrê çawîş, leşkeran gundî weke berê kirine rêzê.

Çawîş ber bi muxtêr çû û serê xwe du-sê caran ber bi jêr ve hejand. Dû re ji nişkê ve piştî destê xwe yê çepê li ser çavên wî xist û got:

- Hûn ê me bixapînin û derewan bikin, haa! Hûn ê ji ber me sîlahan veşêrin!...

Ji xwîna ku li ser çavên muxtêr hişk bûbû, mirov ew nas nedikir.

18

Bi wê şiqama çawîş re xwînê di nava diranên wî de pijiqand. Gava muxtêr tif kir, tifa wî hemû xwîn bû. Ji ber ku hêz tê de nemabû û

bê hêz tif kiribû, tifa wî negihîşte erdê. Tifa wî bi zorê ji devê wî derket û di ser çenga wî re herikî ser sînga wî.

Dû re çawîş emir da du leşkeran da ku wî ji darê vekin. Leşkeran zû zû girêkên kindirê vekirin û muxtar ji darê vekirin. Muxtar nikanîbû li ser lingan rawestiya, du-sê caran hejiya û ket. Leşkeran bi herdu milên wî girtin, ji erdê rakirin û ew li ser lingan rawestandin. Dû re leşkerekî din satilek ava cemidî bi ser serê wî de kir. Bi wî awayî muxtar bi zorê li ser lingan rawestiya.

Çawîş bi gavên giran ber bi wî çû, tiliya xwe ya girdikê da bin çenga wî, serê wî bilind kir, ziq li çavên wî nihêrî û bi hêrs got:

- Tu ê sîlahên gund bidî hev an na?

Ji lêdanê deng di muxtêr de nemabû, bi zorê deng jê derket:

- Tu sîlah li giind nemane, tiştên ku hebûn me teslîm kirine.

- Tiştê ku hebûn we teslîm kirine? De zû kincên xwe ji xwe bike!

Muxtêr fêhm nekir bê çawîş çî got, di cihê xwe de bêdeng ma.

Îcar çawîş çoka xwe li gunê wî xist û bi ser wî de qîriya:

- Ez ji te re dibêjim, kincên xwe ji xwe bike!

Bi lêdana wî re muxtêr destên xwe avêtin nava çîmên xwe. Wisa janê da dilê wî ku wextî bêhiş biketa. Dû re hêdî hêdî çakêtê xwe ji xwe kir.

Çawîş:

- Qutikê xwe jî ji xwe bike! Divê tişteke li te nemîne!

Muxtêr êleg û qutik jî ji xwe kirin. Bi wî awayî ji navê bi jor de tazî ma. Pirça sînga wî ya spî ji xwîn û xwêdanê li hev geriyabû. Çawîş destê xwe li ba kir û got:

- De, de! Ji xwe bike! Pantor jî ji xwe bike! Divê tişteke li te nemîne!

Divê tu şût û tazî bimînî.

Muxtêr bişkokên pantorê xwe jî vekirin û ew jî ji xwe kir. Tenê

derpiyê wî yê kurt û spî lê ma û bi stûxwarî li çawîş nihêrî.

Çawîş bi hêrs destê xwe ber bi derpiyê wî ve kir û got:

19

- Wî jî ji xwe bike! Wî jî ji xwe bike! Min pêşî ji te re got, ku tu sîlahên gund neynî teslîm nekî, ez ê te mîna kûçikan tazî bikim û li nava gund bigerînim.

Muxtêr hêdî destê xwe avête piziya derpiyê xwe û derpî jî ji xwe kir. Gava wî derpî ji xwe kir, hemû gundiyan ku li wir hatibûn civandin li çavên hevdu nihêrîn. Leşkerekî dîsan satilek av bi ser muxtêr de kir. Çawîş bi sê-çar gavan bi paş de çû û bi hêrs got:

- De! De xwe weke kûçikan dawşîne!

Muxtêr xwe dawşand. Ava ku ji wî hat, weke dilopên baranê bi ser gundiyan de hate reşandin.

Paşê çawîş emir da du leşkeran da ew jina muxtêr bînin. Leşkeran zû ji çawîş re silav dan û bi rev çûn jina muxtêr anîn.

Gava jinik di wê rewşê de çav li mêrê xwe ket, kir qêrîn, ji leşkeran re xeber da û xwest ku xwe biavêje ser mêrê xwe. Lê, leşkeran hişk bi milên wê girtin û ew bi paş ve kişandin. Dû re zor lê kirin, ku ew li mêrê xwe siwar bibê. Hingî çend peyan xwe li leşkeran rakişandin û nemirovatiya wan ji wan re gotin, lê leşkeran zû ew bi qundaxên tivingên xwe dane rawestandin.

Muxtêr bi stûxwarî ji jina xwe re got:

- Were keçê, were li stûyê min siwar bibe, tişt nabe. . .

Jinikê mêrê xwe neşikand, çû, destên xwe li stûyê wî gerandin û li pişta wî siwar bû.

Çawîş pehînek li jinikê xist û got:

- Wilo nabe! Wilo nabe! Divê tu li kolana wî siwar bibê.

Îcar muxtar li ser tûtikan rûnişt û jina wî li kolana wî siwar bû.

Çawîş serê xwe ber bi jêr ve hejand û bi devkenî got:

- Ha wilo, ha!. . . De, du caran here heya dibistanê û vegere!. . .

Muxtêr berê xwe bi dibistanê vekir û meşiya. Dibistan bi qedere sed metreyî dûrî wan bû, camên wê şikestî bûn û li ser dîwarên wê hemû hatibû xeritandin. Piştî ku muxtar bi zehmetiyeke bêhawe du caran çû heya dibistanê û vegeriya, çû ba çawîş û jina xwe ji ser stûyê xwe daxist.

20

Çawîş destê xwe avêt pirça sînga wî, çend ta jê kişandin û bi hêrs got:

- Tu ê tivingên gund bidî hev an na? Muxtar ji hêrsan dilerizî, çavên wî sor bûbûn û pirça canê wî mîna ya jîjo lê gij bûbû. Piştî ku hebekî fikirî, got:

- Tu xwe du rojan li me ragire. Piştî du rojên din ez ê hemû tivingên gund bidim hev û bi destên xwe ji we re bînim.

Hingî hemû gundiyan bi şaşmayî li çavên hevdu nihêrîn. Şika hemûyan ji hevdu çêbûn. Hinan di dilê xwe de gotin: "Ma qey ev muxtar dêhn e, ma ji ku sîlah li gund mane?"

Wê rojê heya bi êvarî leşkeran lêdan û îşkence li gundiyan kirin û li malên hemûyan yek bi yek geriyan. Tu qul di gund de nehiştin ku ew lê negeriyên. Dawî, berî ku ew ji gund derkevin, dîsan çawîş çû ji muxtêr re got:

- Ger tu piştî du rojên din hemû sîlahên gund neynî teslîm nekî, ez ê êgir bera gund bidim, ez ê we gişan bişewitînim!

Berî ku tarî dakeve erdê, hemû leşker li tirimpêlên xwe siwar bûn û ji gund derketin.

Êvarî, hemû zilamên gund li oda gund vehewiyan. Hinan ji muxtêr pirsîn:

- Ma sîlahên me kê heye, ku tu ê piştî du rojan sîlahan bibî teslîmî wan bikî?

Muxtêr bi keder serê xwe hejand û bersiva wan da:

- Ez zanim sîlahên me kesî tune ye. Lê fikrek hate min, ku em hinek pere di nav xwe de bidin hev û herin hin tivingan ji çawîşê qereqola vî gundê cîranê me bikin û bibin bidin wan. An na bêbavan dev ji me bernadin, ew ê her roj bigirin ser gund û namûsa me bînin perakî.

Çend peyayên rîspî peyva muxtêf di cih de dîtin û gotin:

- Lawo Welleh Muxtar rast dibêje. Eskerên tirkan bêbav in, ew dikarin êgir bi gundan bixînin.

Peyakî kal bi qûnkişkê ber bi pêş ve kişiya, berê xwe bi civatê ve-
21

kir û bi dilşewatî got:

Lawo, ma qey nayê bîra we ku van bi saxî kurd dixistin kîsan û davêtin binê golan. Ger niha mirov li binê Gola Wanê bigere, mirov ê bi hezaran miriyên kurdan tê de bibîne. Ma qey nayê bîra we, ku van agir bi gundan dixistin, terş, teba û mirov tevde dişewitandin. Dîsan li wan wilo hatiye. Ew dîsan har bûne û tiştên ku bixwazin wê bi serê me de bikin. Ma ka em ê bi vî awayî çawa zora wan bibin? Em ê çawa bi ser bikevin lawo! Em kêmqewet in, kêmqewet. . . Ji aliyê din ve jî em xwe bi xwe kişiyane ber hev. Em xwe bi xwe mala hevdu wêran dikin. Bila îro em yek bûna û bi destek bûna, bila çend eskerên qûncilik li me wilo bikira. Bila wan em şût û tazî bikirana û jinên me li kolanên me siwar bikirana. Em xerab in, xerab. . . Em dijminên hev in! Em mîna kew û tajiye ne! Em dijminê qewmê xwe ne! Em xerab in! . . .

Gava ew dipeyivî, ji hêrsan hemû laşê wî dilerizî. Piştî ku cigarek

vêxist, dîsan peyva xwe domand:

Wan îro em peya tazî kirin, dê sibe jinên me tazî bikin. Ew ê li ber çavên me dest biavêjin namûsên me!

Êdî hew peyivî, herdu lêvên wî lerizîn û çend dilop hêsir ji çavên wî hatin. Ew ji cihê xwe rabû û çû li quncika herî dawiyê rûnişt. Bi wî awayî hemû gundiyan a xwe kirin yek û di nav xwe de pere dane hev. Yên ku perên wan tune bûn, ji yên din deyn kirin. Sibehê zû, muxtêr û du peyên din berê xwe dane qereqolê. Qereqol bi neh-deh kîlometreyan dûrî gundê wan bû. Gava ew gihîştin qereqolê, roj bi qamekê bilind bûbû.

Çawîş maseyek derxistibû hewşê, bin siya daran û rûniştibû taştiya xwe dbcwar. Muxtar û herdu peya dageriyan hewşê. Gava çawîş çav li wan ket, bi devkenî got:

Te vê sibehê xêr e, Muxtar? Çi bûye?

Muxtar û herdu peya çûne ba wî. Li dora masa çawîş tenê du kursiyên vala hebûn. Muxtar û yek ji peyan li ser kursiyên rûniştin û yên din jî li erdê, li ser gîhayê rûnişt.

22

Çawîş dîsan pirsî:

- De bêje, xêr e Muxtar?

Muxtêr derdê xwe jê re got û ew pereyên ku ji nava gundiyan dabû hev, danî ser masê.

Karê Çawîş bertîlxwarin bû. Wî ji hemû gundên dorhêlê bertîl dixwar. Gava ew çav li wan peran ket, çavên wî beloq bûn û qederekî ziq li wan peran nihêrî. Dû re wî dest û devê xwe bi destmala xwe ya kaxezî pakij kir û rahişt wan peran. Piştî ku hejmartin, xist bêrika xwe, rabû ser xwe û ji Muxtêr re got:

- Ka hûn bidin dû min!

Muxtêr û herdu peyan dane dû çawîş. Herçar bi hev re ketine hundurê embarekê. Embar weke şikeftekê bû. Hundurê wê cemidî û rewagirtî bû.

Çawîş çend tivingên kevin û xerabeyî, yên ku li gundan girtibûn, ji sindoqekê derxist, xiste kîsekî, da destê Muxtêr, destê xwe yê rastê li milê wî xist û bi devkenî got:

- Ku tiştêk ji te re lazim bû, teksîr meke, ez li ber te sekinî me!

Muxtêr di mana "erê" de serê xwe hejand, rahişt çewêl, avêt nava milê xwe û bi herdu peyan re derkete der.

Wê êvarê dîsan gundiyan li oda gund civîn çêkirin.

Hinan gotin:

- Em van sîlahan bi zarokan re bişînin, ew biçûk in, dibe ku ji girtinê bifilitin.

Hinan gotin:

- Na camêr, em ê çawan sîlahan bi zarokan re bişînin? Ma kesî tiştên wilo dîtiye?

Hinan gotin:

- Ya herî baş ew e ku em sîlahan bi kalan re bişînin.

Lê wan dikirin nedikirin li hev nedikirin. Dawî dawî Muxtêr xwe da ber teslîmkirina sîlahan.

Roja piştî wê, sibehê zû Muxtar ji xew rabû, kîsê sîlahan avêt piştê xwe û ji gund derket. Di nîvê rê de, ew pêrgî cîpeke eskeran bû.

23

Eskeran ew dane rewestandin û bi hêrs jê pirsîn:

- Zû losê xwe veke! Ew çi ye di kîsê te de ye?

Muxtêr kîs ji piştê xwe danî û hêdî hêdî girêkên wî vekirin. Ji leşkeran webû, ku ew tûtin e, an jî malê qaçax e. Lê gava ew çav li sîlahan ketin, ew şaş û ecêbmayî man. Bêî ku bihêlin Muxtar bipeyive,

wan bi kulm û pehînan ew li cîpê shvar kirin.

^4

QAÇAXKERIYA BÛBÊ

Bûbê rabû ser xwe, herdu destên xwe dane pişt xwe û ber bi pacê ve meşiya. Ew qederekî wilo bédeng li ber pacê rawestiya. Jina wî dîsan got:

- Bavê min kûçik be ez hew di vî hundurî de disekinim. Ez hew dikarim bi vê kûçikahiya xwe zaroyên te xwedî bikim. Qe bila dilê te bi me bişewite, çi dibe?

Bûbê bi ser de qîriya:

- Ma ez ê çi bikim keçê?

- Ma xelk giş çi dikin?

- Yê xelkê perên wan hene, xelk dewlemend in!

Jinikê berê xwe guhert û dîsan got:

- Yê min ez nizanim, ez hew dikarim di vê malê de bisekinim.

Piştî ku Bûbê cigarek pêça û vêxist, got:

- Ez ê dîsan herim xwe biavêjimê, dibe ku ew karekî bide min.

- Kuro Weleh ew tu karî nade te, ew tenê te dixapîne!

Bûbê hêrs bû, destê xwe li dîwêr xist û got:

- Ma ez wekî din çi bikim, ez bi ku de herim? Ez herim xwe biavêjim kê? Hii?. . . Ka tu bibêje, tu aqilekî bide min!

Jinikê destê xwe li ba kir:

r- Lê lê! Ez ê êqil bidimê, ez ê êqil bi mîrê xerab dim!

Bûbê bû weke îsotê, pehînek du pehîn avêtin wê û bi dengê gur bi ser de qîriya:

- Ger tu aqil nadî min, di karê min de jî xeber mede, zimanê xwe weke zimanê kûçikan dirêj meke!

Herdu bîskê bédeng man, lê tenê dengê îskîna jinikê dihat. Jinikê

ji kerban û ji qehran nikanîbû giriyê xwe bisekinanda. Piştî ku wê bi dawa xwe hêsirên xwe û pozê xwe paqij kir, rabû ser xwe û ber bi *5

dergûşa lawê xwe ve meşiya.

Çavên lêwik ji girî sor bûbûn. Jinikê ew ji dergûşê derxist, vekir, xist hemêza xwe û pêsîra xwe xiste dêv. Gava devê lêwik kete pêsîrê, lawik haş bû û hew giriya. Jinikê îcar xwe da ser kevnikekî û rûnişt. Dû re lawê xwe xiste nava herdu çîmên xwe û hejand.

Piştî ku Bûbê jî cigara xwe di xwelîdankê de vemirand, serê xwe xiste nava çongên xwe û fikirî. Dikir nedikir tu rê ji hev dernedixist. Gelo çi bikira? Ew çend caran li şelandina bankê fikirî, li diziyê fikirî, lê dîsan dev jê berdida û ji wan ramanan bi dûr diket. Paşê bi keder serê xwe rakir û got:

Keçê, min ji te re got, bajar ji me re nabe, em nikanin li bajaran bijîn, lê te bi a min nekir.

Ma min ê çi bi a te bikira? Hûn her tim li ber hev bûn. Ma qey kuştin ji barkirinê çêtir bû?

Kuştin? Mêrik bi hêrs got. Dê wî kûçikê birayê te ez bikuştima? Wî bênamûsê serpîrek?. . . Keçê, min kanîbû çarika jina wî berepaş bida serê wî. Ma bi a te ew jî mên e û dikane mênan bikuje?

Jinikê tu bersiv neda, tenê kire îskîn û bi dawa xwe pozê xwe pakij kir.

Bûbê dîsan got:

Hii. . . Tu wî kûçikê birayê xwe jî peya dihesibînî? Ji te weye ew segê birayê te jî dikane mênan bikuje? Ew jina axê ye, keçê! Jina axê! . . .

Jina wî li ber wî geriya, lawikê xwe danî ser mînderê, bi qûnkişkê ber bi wî çû û serê xwe danî ser milê wî. Lêvên wê weke yên zarokan

dilerizîn û hêsirên wê bi ser hinarîkên wê de dihatin xwarê.
Ew qederekî wilo bêdeng man. Dû re Bûbê destê xwe avêt çenga
wê û berê wê bi xwe vekir. Wan bîskê li çavên hevdu nihêrîn, rabûn
ser xwe û hevdu hemêz kirin. Du-sê caran wisa li ser hev hevdu
hemêz kirin û kûr kûr li çavên hevdu nihêrîn. Paşê Bûbê ew
berda , dîsan çû ber pacê û li derve nihêrî. Jina wî jî da dû wî û ew
ji paş ve hemêz kir. Li derve sê-çar zarokan dileyistin. Piştî ku Bûbê
26

bîskê li wan zarokan nihêrî, li jina xwe zîvirî û ew hemêz kir. Jina
wî jî heya ku jê hat xwe lê pêça.

Piştî ku wan hevdu têr hemêz kirin û xwe li hev pêçan, Bûbê jinik
berda, daqûl bû û rahişt lawê xwe. Wî lawik du-sê caran hol
kir hewa û girt. Piştî ku bîskê bi lêwik re lîst, dû re da destê jinikê û
got:

- Emo, ma tu dizanî ku Êsê cîranê me çi karî dike? Ma tu dizanî
ku ew van peran ji ku derê tîne? Wî ev teksî û televizyon bi çi kirîne?
Emo milên xwe hejandin:

-No...

- Lê, Êso qaçaxkeriyê dike. Şeva wî ne kêmî du hezar lîran e. Te
fêhm kir, du hezar lîra. . .

Emo li ber wî geriya:

- Nebe, nebe, Bûbê! Ez di bextê te û Xwedê de me, tu qaçax maçaxê
meke! Tu dibînî ku her şev teqîn e. Ma te nebihîst ku wê roja
han du kesan xwestibûn keriyek pez derbasî binxête bikin, lê eskeran
li wan teqandibûn, dawî dawî herdu jî hatibûn kuştin û eskeran
meytê wan avêtibûn dû tirimpêlên xwe. Wan ew wilo bi mirîtî
heya bajêr bi dû tirimpêlên xwe de kişandibûn. Gava xwediyê wan
çûbûn ser wan, ew nas nekiribûn, tenê nivê laşên wan mabûn.

Bûbê bi tiliya xwe ya girdikê simbêlê xwe ji devê xwe derxist, kire niçe niç û got:

- Ih... Na keçê, ma ji te tirê ez ê herim keriyên pezan derbasî binxetê bikim? Dîna Xwedê! Tiştê ez dibêjim barkêşî ye. Xwediyê mal û esker bazara xwe dikin û du kes bi sîlah li ba eskeran disekin, ta ku hemû mal tê kişandin. Ma gava du heb bi sîleh li ba eskeran bisekin, wê esker çawa bikaribin bera barkêşan bidin û wan bikujin? Ji te weye hema ez ê herim û bême kuştin. Ez îşê xwe ji tu tiştî naynim. Ez ê tenê barê xwe bikişînim û perên xwe bistînim. Ma ev du salên Êso ye ku ew vî karî dike, çima ew nehate kuştin? Jina wî dîsan li ber wî geriya, bi nermî û bi stûxwarî jê re got:

27

- Bûbê, Xwedê carekê mala meriv xerab dike. Welleh tu bi a min dikî parsê bike û qaçax maçaxê meke.

Bûbê serê xwe kil kir:

- Bi rastî jî aqilê pîrekan tune ye. Keçê qe peyvê fêhm bike. Ez ji te re dibêjim, ku talûkeyeke vî karî tune ye, tu hê jî pitpitê bi ser min de dikî. Ger talûkeyek di vî karî de hebe jî, tenê rasthatin e. Di wê navê de lawikê wan giriya. Emo du-sê caran piştta wî tepand û pêşîra xwe xiste dêv. Dû re ji Bûbê re got:

- Bûbê, ger tu li min nafikirî, li vî tîfalî û birayên wî bifikire, mala me wêran meke.

Bûbê serê xwe hejand û hebekî bi sertî got:

- Keçê, te ez ji niha ve xistime gorê. Ma te xêr e tu vê pitpitê bi ser min de dikî?

Jinikê hew dengê xwe kir, rabû ser xwe, lawikê xwe xiste dergûşê û ew hejand. Piştî ku lawik di xew re çû, wê çû teştta hevîr ji ser textê firaxan daxist, du-sê mist ard berda binê teştê û rûnişt hevîrê xwe

kir.

Bûbê jî cigareke nû pêça, vêxist û derket derve. Taxa ku ew lê rûdiniştin nû ava bûbû. Hema hema hemû xanî yekqatî bûn û nuh hatibûn lêkirin. Xanî firk bûn, yek li vir, yê din taa li dera hanê bû. Erdên vala, yên ku di navbera wan xaniyan de mabûn jî, hemû hatibûn firotin. Yên ku çend kevir li şûna eresa xwe danîbûn û yên ku qorek du qor asasê xaniyê xwe avêtibûn. Piştî salek du salên din ew ê bibûya taxeke nû di bajêr de.

Bûbê, çav li wan peyayên ku li ber siya dîwêr rûniştibûn, ket. Wî xwe li civatê girt, çû nik wan, silav da wan û rûnişt. Gişan bi hev re silava wî lê vegerandin û bi dorê jê re "merheba" gotin.

Dû re Êso jê pirsî:

- Cîran, tu van rojan nexuyabû, ma tu bi derinan de çûbû?

Bûbê piştî cigara xwe bi binê şekala xwe vemirand, got:

- Erê Weleh cîran, ez ber bi Kertwênê ve çûbûm.

- Çima, xêr bû?

28

- Xêr bû cîran, ji bo kar bû.

Êso keniya, li civatê zîvirî û got:

- Karê cîranê min Bûbê nabe, vî bajarê Nisêbînê yê mezin dihêle, dihere li gundan li kar digere.

Dû re berê xwe bi Bûbê ve kir û jê pirsî:

- Ma ew çi kar bû cîran?

- Karê cenaniyê bû lo. . .

- Êêê. . . ma çima te dewam nekir?

- Karê wan hew ew bû. Tenê du roj bûn.

Qaso cigara ku pêçabû dirêjî Bûbê kir. Bûbê cigare ji destê wî girt û got:

- Apê Qaso, ma tu ji nexweşiya xwe çawa bû? Min bihîst tu çûbû ser doktor.

Qaso serê xwe bi aliyekî ve xwar kir û got:

- Welleh birazî ez weke berê me. Doktor emeliyata min dixwaze, lê buha ye, qeweta min nagihîjîyê.

- Ma doktor nabêjin nexweşiya te çi ye?

- Dibêjin, kevir di gurçikên te de hene, ma ez çi zanim. . .

Memo peyva wî birî:

- Aaappê Qqqaso, jjjjibo kkkevir bbbbbbîra bbbaş e. Bbbbbbîra vwexwe.

Paşê Memo paş guhê xwe xurand û kenîya.

Memo lalikî bû. Emrê wî li dor bîst salan bû. Bejna wî dirêj û zeyif bû. Kincên wî pînekirî û pertal pertalî bûn. Ew carna li nav taxê xwas digeriya. Porê wî tim meqeskirî bû. Serê wî biçûk û guhên wî mezin bûn. Di wê taxê de tu kes ji Memo nedixeyidîn û dilê xwe jê nedigirtin.

Uso berê xwe bi Memo vekir û got:

- Memo, van qeşmeriyan meke, dê apê Qaso çawan bîra vexwe?

Piştî ku Memo solên xwe xistin bin milê xwe û pal da, got:

- Wwwwlllleh eeezz rrast ddddibbbêjjjim bbebbbîrra jjjji bbbo keeeewir bbebebbbaş e.

29

Qaso wa bi şaşmayî jê re got:

- Kuro bîra çi ye, Memo? Ev bênamûs qala araqî maraqiyê dike, an...

Di wê navberê de Evdiko silav da wan û rûnişt. Piştî ku hemûyan silava wî lê vegerandin, Qaso henek pê kir:

- Kuro Evdiko, tu hew li me dipirsî, ha! Qey tu jî dewlemend bû

yî?

- Na Welle apê Qaso, çi dewlemendî û çi hal. Bi zorê roj di ser me re derbas dibin.

Îcar Bûbê jê pirsî:

- Evdo, min bihîst tu li Edenê kar dikî, ma li wan deran kar tune yelo?

Evdiko serê xwe bi neyînî hejand:

- Na cîran, karê çii, halêçi?...

Bûbê dîsan got:

- Welleh ez rast dibêjim, ger li wan deran kar marek hebe ez ê jî bêm.

- Na Welleh cîran, tu kar tune ye. Avahiya ku em tê de kar dikin, vê sala ku were ew ê bîst karkeran jê derxin. Ez ji xwe jî ditirsim. Ez ditirsim ew min jî derxin.

Piştî demekê jina Bûbê bi teştî nê di ber civatê re derbas bû û got:

- Ma hûn nanê germ naxwin?

Qaso bi devkenî got:

- Belê Welle keça min, hela tu bi xêra bavê xwe kefekê bi apê xwe de.

Emo teştî nê ji ser milê xwe daxist, danî ser çoka xwe, nanek jê derxist û dirêjî Qaso kir. Qaso ew nan kir du perçe, perçê din dirêjî Emo kir û got:

- Rehma Xwedê li dê û bavê te be!

Memo jî ji cihê xwe pekiya, ew perçê din ji destê Emo girt û bi qertan kişiyayê. Dû re wextî tişteke bigota, lê Êso peyva wî birî û

30

nehişt ew bipeyive.

Emo ji Qaso pirsî:

Min ji bîr kir ez bipirsim, apê Qaso, ma gelo nexweşiya te çawa bû?

Qaso herdu destên xwe bet bi hewa vekirin:

Ez li ber rehma Xwedê me.

Xwedê şifa xwe li te bike apê Qaso.

Dû re wê teştê nanê xwe danî ser milê xwe û ber bi malê ve meşiya.

Êdî hêdî hêdî dibû êvar. Zarokên ku li meydana vekirî bi topê dileyistin, jinên ku li ser tenûrê nanên xwe lêdixistin, ew jî hêdî hêdî winda dibûn. Peyayên ku li ber dîwêr rûniştibûn jî rabûn ser xwe û her kes ber bi malên xwe ve çûn.

Piştî şîvê Bûbê ji jina xwe pirsî:

Emo, ma em bîskê nerin mala cîranê me Êso?

Emb bi rakirina firaxan mijûl bû, piştî ku wê sifre rakir, got:

Baş e, wê çaxê ez lêwik şîr bidim, dû re em herin.

Piştî ku wê zîkê lêwik jî têr kir, lawik xist hemêza xwe, da dû Bûbê û derketin.

Herdu lawikên wan yê mezî jî çûbûn mala hevalên xwe. Bûbê li ber derî ji jina xwe pirsî:

Ma zarok werin ew ê zanibin ku em li mala Êso ne?

Erê, erê, ew ê zanibin, Emo di ber xwe de got.

Malên wan nêzîkî hev bûn. Di navbera malên wan de tenê du xanî hebûn. Gava ew gihîştin ber hewşê, jina Êso ew dît. Jinik li ber derî lawik ji destê Emo girt û bi hev re derbasî hundur bûn.

Êso cigara wî di dest de bû, li ser doşekê pal dabû û li televizyonê dinihêrî.

Bûbê henek kir:

Ma hûn mêvanan vedihewînin?

Ûso kenîya:

Mêvan mêvanê Xwedê ne.

Dû re ew ji cihê xwe rabû û cih da wan.

3i

Bûbê derbasî ser doşekê bû, Emo û jina Ûso jî li jêrî wan rûniştin.

Piştî ku Ûso cigare îkramî Bûbê kir, li Emo zîvirî û got:

- Maşaleh lawikê we mezin bû ye. Gelo navê wî çî bû?

Ji berdêla Emo Bûbê bersiv da:

- Navê wî Şoreş e. Lawê Qaso ev nav lê kiriye.

- Şoreş navekî xweş e. Ma tu zanî mana wê çî ye?

- Erê we, ez çawan nizanîm.

Di wê navberê de nûçeyên televizyonê dest pê kir. Ûso rabû ser xwe û piçekî dengê televizyonê bilind kir. Piştî ku wan li nûçeyan guhdarî kirin, jina Ûso çayê anî ber wan. Bi çayê vexwarinê re Bûbê ji Ûso pirsî:

- Cîran, riceke min ji te heye.

Ûso qedeha di destê xwe de danî û bi şaşmayî got:

- Estexfurullah cîran, kerem bike!

- Tu dizanî ku ez bê kar im û tu kar bi dest min nakeve...

Ûso peyva wî birî:

- Eê cîran. . .

- Gelo ma tu ê nikanibî li ba xwe karekî ji min re jî peyda bikî?

Ûso cigarek îkramî wî kir û yek jî vexist. Piştî ku qurtek li çaya xwe xist, got:

- Bawer bike cîran, di vê demê de parîkî dijwar e. Lê em ê dîsan jî bikanibin ji te re karekî peyda bikin.

Wan wê êvarê heya bi dereng şevbuhêrkiya xwe li mala Ûso kirin.

Piştî wê bi du-sê rojan, şevêkê Ûso li deriyê wan xist û got:

- Cîran, rabe xwe kar bike, em ê îşev dakevin binxetê!
Gava Bûbê dengê Êso bihîst, bi lez ji nava nivînê xwe pekiya,
kincên xwe li xwe kirin, rahişt werîsê xwe, derket, da dû Uso û lezand.
Şev reş û tarî bû. Ji xwe gava li Nisêbînê şev wilo reş bûya, xelkê
digotin: "îşev şeva qaçaxçiyên e". Şev wilo reş bû, ku ne ji şewqa
elektirîkên hin malan bûya, mirov nizanîbû ku tu kes li wê taxê dijîn.

31

Piştî ku ew ji çem derbas bûn, gihîştin nik hevalên xwe yê din.
Komek barkêş di nava erdê pişt pira Alman de li hev civiyabûn. Piştî
ku ew bîskê li hev rûniştin û rêberan şîret li wan kirin, rabûn ser
xwe û her çend kes bi derekê de çûn.

Grûba Bûbê û Êso xwe di bin pirê re berdan û ber bi tixûb ve
meşyan. Ji xwe tixûb ne dûrî bajêr bû. Bajarê Nisêbînê û Qamîşlo
bi hev ve ne. Ne ji sînorê bi têt û mayin be, mirov dibêje qey herdu
bajarek in.

Piştî demekê ew gihîştin ber tixûb, xwe li wir qederekî dane erdê
û li rêber guhdarî kirin.

Wê şevê dê xwediyê mal serê barkêş du hezar lîra bidaya wan. Ji
ber ku Bûbê hê nû bû, dê tenê hezar û pêncsed lîra bidaya wî. Piştî
ku ew jî çendakî biçûya û bihata û jêhatî bûya, dê du hezar bidaya
wî jî. Lê hezar û pêncsed jî ji Bûbê re ne hindik bû. Gava wî bihîst
ku ew ê hezar û pêncsedî bistîne, kêfa wî hat û di dilê xwe de got:
"Ku ez şevê hezar û pêncsed lîran kar bikim, ne hindik e, kiriya xaniyê
min ya du mehan derdikeve û ez ê ji Emo û ji zarokan re hinek
kinc bikirim û ji xwe re jî kêsek tûtin. . . "

Bûbê pir poşman bûbû ku wî heya niha ev karê bi pir pere nekiribû.

Wî bîskê jî hin xeyal anîne ber çavên xwe.

Berî ku ew li têtlan bixin û derbasî binxetê bibin, dîsan rêberê

wan ji wan re got:

- Divê hûn qet gavên xwe şaş navêjin û ji ser şopa min şaş mebin ha!...

Pêşî rêber sîlaha xwe avêt milê xwe, bi meqesa têlber têl birîn û hemû yek bi yek derbas bûn. Ew ketin rêzê û li dû hevdu bi qulûsî meşyan. Lê dilên hemûyan bi tirs bûn. Êso û Bûbê li herî dawiyê bûn. Piştî ku ew çend gavên baş di nava tixûbê binxetê de meşyan, Êso hêdî ji Bûbê re got:

- Cîran, tu lingên xwe şaş neavêjî ha! Ji ser şopa min danegere! Bûbê bi tirs li dû hemûyan, bê ku gavên xwe şaş biavêje dimeşya.

33

Piştî ku ew kurtedemekê wisan çûn, ji nişkê ve kozikeke leşkeran li pêşya wan derket û li wan teqandin. Rêberê wan jî xwe li ser zik avêt erdê û wî jî li leşkeran reşand. Şansê wan hebû ku ew ji erdê bi mayin xelas bûbûn. Ji ber ku Êso zû de ev kar fikir, bi rewşê dizanîbû. Wî hema xwe avêt destê Bûbê û bi heyecan got:

- Cîran, bide dû min!. . .

Êso, Bûbê û barkêşên din hemû destvala bûn. Loma ew mecbûr man ku baz bidin û xwe xelas bikin. Wan xwe avêtin pişt girikekî nêzîkî Qamîşlo û xwe xelas kirin. Lê tenê rêber di nava leşkeran de ma. Wî û leşkeran her li hev diteqandin. Paşê wî jî xwe bi bazdanê gihande ba barkêşan. Wê şevê hemû bi saxî derbasî binxetê bûn. Bûbê wisan poşman bûbû ku ew di jiyana xwe de tu caran ewqasî poşman nebûbû. Wî bîskê jina xwe û gotinên wê anîne ber çavên xwe "Bûbê, Xwedê carekê mala meriv xerab dike. Welleh tu bi a min dikî parsê bike û qaçaxê meke. Bûbê, ger tu li min nafikirî, li vî tîfalî û birayên wî bifikire, mala me xera meke".

Di wê navberê de Êso tiştê got, lê Bûbê fêhm nekir, veciniqî û

pirsî:

- Çi, ma te tişteke got, cîtan?

Ûso zanîbû ku Bûbê tirsîya ye. Ji ber ku gava cara pêşî ew derbasî binxetê bûbû, ew jî bêhawe tirsîya bû.

Wan di eynî şevê de mal derxistin. Ne di cihê berê re, lê di cihekî dûrî bajêr re derxistin. Kişandina mêl tenê du saet kişand û mal hemû çayê bû.

Bûbê saet li dor pêncê sibehê vegeriya malê. Hêdî, bê ku kesî hişyar bike derî vekir û kete hundur. Ew hezar û pêncsed lîrayê ku kar kiribû xist bin behlîfa xwe û tevî kincan xwe avête nava nivînan. Hema ku ew xilmaş bû, wî xewn dît. Lê çi xewn?... Di xewnê de ew di nava tixûb de bê heval mabû. Leşkeran her li wî diteqandin û didane ser piştê wî. Lê wî fikir nedikir nikarîbû bazda, gavên wî li hev digeriyên û dikete xwarê. Leşkeran nêzîkî lê dikirin û yekî ji leşkeran gulle diajote ber tivinga xwe û ji wî nîşan digirt. Lê Bûbê bi

34

qêrînekê re hişyar bû. Gava Bûbê dît ku xewn e, hema xwe avêt jina xwe û ew hişk hemêz kir.

Jina wî ecêbmayî mabû, jê pirsî:

- Çi ye Bûbê? Ma çi qewimî ye? Ma ne tu ê îşev biçûya binxetê?

Bûbê ji ber xewna xwe di xwêdanê de mabû. Wî keserek kûr berda û ji kêf û heyecanan hêşir ji çavên wî hatin. Dû re wî behlîfa xwe bilind kir, ew hezar û pêncsed lîrayên ku kar kiribû, nîşanî jina xwe da û dîsan ew hemêz kir.

35

HEMÎDOÛAVÛKAT

Hemîdo li deriyê daîra avûkat xist û kete hundur. Avûkat ji cihê xwe rabû û destê xwe da wî. Piştî ku ew bi cih kit, cigara xwe ya

Marlboro ji çavîka masê derxist û dirêjî wî kir:
 Kerem bike, cigarekê bikişîne, bi devkenî got.
 Hemîdo cigarek ji pakêtê kişand û vêxist. Piştî ku du-sê hulm li
 cigarê xist, ji avûkat pirsî:
 Ma gelo rewşa lêwik çawan bû, ebûqat beg? Ew ê bi vê îfadê bê
 berdan an na?
 Avûkat destê xwe avête simbêlê xwe, hûrik hûrik pê leyist û bersiva
 Hemîdo da:
 Min ji te re carekê soz daye camêr. . . Vê carê ew ê bê berdan
 Gava avûkat wilo got, Hemîdo ji cihê xwe rabû ku destê wî maçî
 bike, lê avûkat destê xwe kişand û nehişt:
 Ez rice dikim, Hemîd, got. Em birayên hev in.
 Hemîdo dîsan li cihê xwe tûnişt:
 Wisa kêfa min tê, ebûqat beg. Ez nizanim bê ez ê ji kêfan çi bikim.
 Axx. . . Ku di vê mehkemê de Seydo bihata berdan. Wele ez di
 van riyana de mirim, ez di bin deynan de şewitîm.
 Avûkat destmala xwe ya kaxezî ji bêrîka xwe derxist û pozê xwe
 pakij kir:
 Lê ew bazara ku me kiribû nabe, got. Divê tu pênc hezar lîrayên
 din jî bidî.
 Gava avûkat wilo got, ew kêfa Hemîdo hemû lê bû kul û derd.
 Ew ji hêrs û heyecanê lerizî û çavên wî mîna du fîncanan vebûn. Bi
 gîr kursiya xwe ber bi masa avûkat ve kişand û gôt:
 Me berê bazara xwe bi deh hezaran kiribû, lê te kir panzdeh û
 te got ku tu ê lêwik bidî berdan. Lawik nehate berdan. Dû re te
 36
 pênc hezarên din jî li min zêde kir û te got çawan bibe bila bibe, ez
 ê vê carê lêwik bidime berdan. Lê lawik nehate berdan. Va niha tu

pênc hezarên din jî li min zêde dikî. Ma ez ê van peran ji ku bînim ebûqat beg? Ez ê herim xwe biavêjim kê û peran ji wan deyn bikim? Ma tu kesê ku min pere jê nexwestibin mane? . . .

Avûkat hebekî bi sert peyivî:

- Tu peran ji ku tînî bîne. Ger tu pênc hezarên din jî zêde nekî, dibe ku vê carê jî lawê te neyê berdan.

Du pirtûkên kurdî bi lawê Hemîdo re hatibûn girtin. Ji bo herdu pirtûkan qala heft sal ceze dibû. Hemîdo ji bo ku lawê xwe bide berdan tiştên ku ji destên wî dihatin fikir. Mala wan tê li Diyarbekirê bû. Lê ew ji bo îfada lawê xwe her tim diçû Edenê. Ji ber ku lawik li Edenê hatibû girtin û diviya bû îfada wî li Edenê bihata dayin. Avûkatê ku girtibû, her tim li wî wilo fikir. Her carê digot " A ez ê vê carê lawê te bidime berdan" û carê pênc hezar lîra lê zêde dikir û lawik nedihate berdan.

Cara pêşî bazara wan deh hezar lîra bû, lê dû re avûkat lê zêde kir û kire panzdeh. Her carê ku lê zêde dikir, digot " Ez ê lêwik bidime berdan". Hemîdo jî ji bo berdana lawê xwe diçû xwe davêt nas û dostan, pere ji wan deyn dikir û dianî dida avûkat. Lê hêviya Hemîdo ya mezin di vê carê de bû. Gava vê carê jî avûkat qala pênc hezar lîra kir, Hemîdo di dilê xwe de got: "Wele ew vê carê jî nayê berdan". Piştî ku hebekî fikirî:

- Baş e, bi dengê nîzim got. Ez ê vê carê jî qebûl bikim. Lê ku lawik vê carê jî neyê berdan?

Avûkat hebekî kutsiya xwe bi paş ve kişand, herdu lingên xwe avêtin ser hev û got.

- Yaho min ji te re carekê soz daye. Soza min soza mêran e! Ma qey tu ji min bawer nakî?

Hemîdo wextî bigota te berê jî digot, soza min soza mêran e, lê

negot, rabû ser xwe û jê pirsî:

- îfada wî saet di çi de ye?

37

Avûkat milê çakêtê xwe hilda jor û li saetê mêze kir:

- îfada wî saet di sisiyan de dest pê dike, got, saet niha deh e.

Divêmsaet sisiyan liwîrhazir bin.

Hemîdo xatir jê xwest û ji hundur derket.

Hemîdo yekî dirêj û zeyif bû. Emrê wî an çil hebû an tunebû. Lê porê wî spî bûbû. Ne tenê porê wî, hetwisa simbêlê wî jî spî bûbû. Ger ne ji lixwekirina wî ya Diyarbekirî bûya, mirov ê bigota qey ew şêst salî ye. Wî bi wî awayî serê xwe xiste ber xwe û bi dilkulî ber bi mala dostê xwe ve meşiya. Gava ew gihîşte ber mala dostê xwe û kete hewşê, dostê wî bi jin û zarokên xwe re li hewşê, li bin siya mêwê rûniştibûn. Gava ew çav li Hemîdo ketin, hemû ji cihê xwe rabûn û cih danê. Piştî ku Hemîdo rûnişt, jinikê berî mêrê xwe jê pirsî:

- Kekê Hemîdo, gelo rewşa lêwik çilo bû?

Hemîdo herdu destên xwe ber bi hewa ve kirin:

- Ez li bendî rehma Xwedê me.

Mêrik ji cihê xwe rabû û cih da Hemîdo:

- Hela tu cihê xwe xweş bike kekê Hemîd, got û li jina xwe zîvirî.

Keçê niha kekê Hemîdo birçî ye, hela tu malhaziriyekê jê re bîne.

Jinikê destên xwe danîn erdê ku rabe ser xwe, Hemîdo nehişt û

got:

- Na xwişka min, tu li cihê xwe rûnê, ez têr im.

- Ma tu çayekê jî venaxwî?

Hemîdo destê xwe yê rastê danî ser sînga xwe, serê xwe tewand û

got:

- Xwedê zêde bike. Welleh dilê min nabije tiştêkî. Lê tenê riceke min ji we heye.

Mêrik bi pêş de hat:

- Estexfurula kekê Hemîd, got. Em birayên hev in. Tiştê tu dixwazî ser serê min û ser çavên min. Lê tenê ku ji destên min bê.

Hemîdo qederekî fikirî:

- Wele pênc hezar lîra ji min re lazim e, bi stûxwarî got. îfada lê-3»

wik îro saet di sisiyan de ye. Wî bênamûsê ebûqat dîsan pênc hezar lîra li min zêde kir. Ger ez îro peran negihînimê berdana lêwik tune ye. Qala heft sal ceze dibe.

Mêrik ji jina xwe nepirsî bê tu perên wan li mal hene an na, weke ku milyonên wî li mal hebin, got:

- Wey ser serê min û ser çavên min. Mirov carekê li hev diqewime. Ji bo Seydo tiştê ji destê min bê ez ê bikim. Li ba min ferqa Seydo û Silêman tune ye. (Silêman lawê wî bû.)

Piştî wan peyvên mêrik hêviyek ji Hemîdo re çêbû. Dîsan wî ew kul û derd hemû ji bîr kirin û şûna wan kêfû şahiyê girtin.

- Çer ku ez vegerim, ez ê ji we re perekên we poste bikim, Hemîdo bi dilşahî got.

- Hela hiş be lo, jehr di nava peran de be. Bila lawik were berdan, bavo ji min re tu pere ne lazim e.

Dû re ew rabû ser xwe û çû hundur. Piştî demek kurt jina wî jî rabû ser xwe û çû hundur.

- Kuro ma ka em ê evqas pere jê re ji ku bînin? jinikê ji mêrê xwe pirsî. Ma tu pere li mal heye?

- Na Wele, evqas pere tune ye, lê çi dibe bila bibe, divê em jê re peyda bikin. Tu nizane bê Hemîdo çi peya ye! Ger ez lê biqewimiyama

wî ê canê xwe ji min re feda bikira.

- Baş e, ger evqas pere li mal tune be, tu ê jê re ji ku peyda bikî?

- Ma wê li ba cîranê me Elî tune be?

- Tu bi a min bikî li ba wî hebe jî, jê nexwaze. Ew dinya nedîtîyê ha wê me di koda ribabê ke.

Mêrik tiliya xwe ya eşedê danî ser cênîka xwe û hebekî fikirî:

- Ma we wekî din li ba kê hebe? got. Gelo ez ji kê bixwazim?

- Ma wê li ba cîranê me Bozo tune be ?

Mêrik herdu destên xwe li hev xistin:

- A Weleh we li ba wî hebe, bi ken got. Wî erdê xwe yê li gund firotiye. Ger li ba wî hebe, ew ji min re nabêje, na.

- De zû here, berî ew ji mal derkeve, jinikê got , çû çaydan tijî av
39

kir û danî ser êgir.

Mêrik bi kêf derket der, çû ba Hemîdo, destûra neh-deh deqîqan jê xwest û ji hewşê derket.

Hemîdo bi çîrokê hesiyabû. Lê wê çi bikira? Ger ew ne di wê rewşê de ba, wî tii caran dostê xwe fedîkar dernedixist.

Piştî ku mêrik ji hewşê derket, jinik di gel siniya xwarinê hate bin siya mêwê, ba Hemîdo.

Te ê zehmet nekira xwişka min, Hemîdo bi devkenî got.

Ma çi zehmetiya wê heye kekê Hemîd? Me ji te re tu berx serjê nekiriye. Wele malhazirî hew ev bû, divê tu li qusûra me nenêrî.

Ez ê çi li qusûra we binêrim? Yê ku li qusûra min nenêrin hûn in.

Dû re wî li ber siniya xwarinê çarmêrkî veda û xwar. Piştî ku têr xwar, av vexwar û ji siniyê vekişiya.

Xwedê zêde bike, min têr xwar, got.

Jinikê dîsan siniya xwarinê ber bi wî ve dehfa:

Çima kekê Hemîd, ji bo çi te nexwar?

Xwedê zêde bike, min têr xwar, Hemîdo dîsan got.

Piştî ku Hemîdo cigarek pêça û vêxist, mêrik hat. Wî silav da Hemîdo û xwe bi kêf da ser mînderê. Hemîdo cigarek pêça, dirêjî wî kir û bi stûxwarî got:

Mehmûd, divê tu li min negirî, li qusûra min nenêrî. Ez çi bikim, Weleh ez ne di vê rewşê de bûma, min tucarî tu fedîkar dernedixist. Lê ez mecbûr im ku biraziyê te xelas bikim.

Mehmûd destê xwe xist bêrîka xwe, ew pênc hezarên ku ji cîranê xwe deyn kiribû, dirêjî Hemîdo kir û got:

Ez rice dikim kekê Hemîd, got. Ne hewce ye tu evqasî xwe kêr bibînî. Em birayên hev in. Ma bavê te hindikî alîkarî bi bavê min kiriye?

Hemîdo bi hêvî ew pere ji destê wî girt û spasên xwe jê re got.

Piştî ku bîskê qala derd û kulên dinyayê kirin, Hemîdo destûra xwe û rabûnê jê xwest.

40

Ma gelo kêreke we ya zêde tune ye, Hemîdo got. Belkî ez ji xwe re li bajêr pê fêkî bixwim.

Jinikê baz da hundur, kêreke biçûk anî û da destê wî. Hemîdo ew kêr ji destê jinikê girt û xist bêrîka xwe.

- Bi xêr ez careke din werim ez ê kêrika we ji we re bînim, got.

- Careke din çawa, mêrik got. Hûn îşev mêvanê me ne. Bi xêr çer ku lawik were berdan hûn rast werin vir. Bila biraziyê min hebekî xwe rehet bike, bêhna xwe berde. Ev serê du mehan e ew girtî ye, niha ew pir betilî ye û aciz bûye. Em ê îşev bi hev re şîveke bbcwin. Hemîdo rabû ser xwe û xatir ji wan xwest:

Bi xêr lawik were berdan, em îşev mêvanê we ne, got, derket û çû.

Piştî ku Hemîdo çû, mêtik lawê xwe şande bajêr da hinek goşt û sebze bikire.

- Welleh heqê vî ebûqatî kuştin e, jînikê ji mêrê xwe re got. Ma îcar ev çi ye, her carê pênc hezaran li vî belengazî zêde dike. Derewan jî lê dike, dibêje, ez ê lawê te bidim berdan.

Mêrik serê xwe hejand:

Ne keçê tu bi vî welatî nizanî. Ew li ser dizî û sextekariyê hatiye avakirin.

Êdî ew hew peyivîn. Mêrik çakêtê xwe avêt nava milên xwe û derket derve. Lê, jina wî bi dû wî de bang kir.

- Mehmûd, îro hebekî zû were mal ha! Dibe ku kekê Hemîdo û lawik zû werin.

Mêrik di ber xwe de got:

Erê erê, ez ê zû werim.

Hemîdo li dor saet didowan gihîşt ber avahiya avûkat. Wîdestmala xwe ji bêrîka xwe derxist, xwêdana ser çavê xwe pakij kir û bi derencan ve bi jor ket. Ew gihîşte ber deriyê daîra avûkat, li derî xist û kete hundur. Pirtûkeke mezin di destê avûkat de bû û lê dinihêrî.

Gava Hemîdo kete hundur, avûkat pittûka di destê xwe de danî,

4i

rabû ser xwe û destê xwe da wî.

Maşalê te pere anîbin, bi dengê ne zelal got.

Hemîdo di mana "erê" de serê xwe hejand û ew pereyên ku anîbûn dirêjî wî kirin.

Piştî ku avûkat ew pere hejmartin, çavîka masê kişand û xistiyê.

Dû re li Hemîdo zîvirî.

Divê em hêdî hêdî herin, got. Tenê niv saeta me maye.

Ma çi jê dikeve serê te, ebûqat beg? Hemîdo bi stûxwarî jê pirsî.

Ma tu dibêjî wê lawik vê carê were berdan?

Erê, erê, avûkat got. Ez texmîn dikim ew ê vê carê were berdan.

Paşê ew rabûn ser xwe. Avûkat çentê xwe xist destê xwe, Hemîdo da dû wî û di derencan de daketin jêr. Ew li otomobîla avûkat siwar bûn û berê xwe dane mehkemê.

Hemîdo ji hêrsan dilerizî. Mûyên canê wî lê gij bûbûn, çavên wî fireh dibûn û firnikên pozê wî radibûn û dadiketin. Wî hêdî destê xwe dirêjî bêrîka çakêtê xwe ya hundur kir û du-sê caran destê xwe di ser kêrê re bir û anî. Di dilê xwe de got: "Ger vê carê jî lawik neyê berdan, ez ê vî ebûqatî bidim ber kêran".

Hundurê avahiya mehkemê tijî mirov bûn. Ew di hêwanê de du sê caran çûn û hatin. Piştî ku Hemîdo cigareyek pêça û vêxist, ji avûkat pirsî:

Ma tu dibê ew ê vê carê lawik were berdan ebûqat beg?

Avûkat li ber pencerê bû, li derve mêze dikir; mîna ku dengê Hcmîdo neçûyê, ew bê deng ma.

Hemîdo dîsan got:

Ma çi jê dikeve serê te ebûqat beg? Ma tu dibê ew ê vê carê were berdan?

Berî ku avûkat deng bike, mehkeme vebû. Avûkat û Hemîdo bi lez ketin hundur. Herdu destên lêwik li ser hev bûn û di nava du eskeran de di huzûra hakim û sawcî de rawestiya bû. Gava ew çav li bavê xwe ket, wî herdu destên xwe ji bavê xwe re hejandin û got:

Bavo, ma te çi kir?

4^

- Hiş be, leşkeran bi dengê nizim, lê bi sert gotin.

Hemîdo şewqê wî di destên wî de bû û bi heyecan li wan du sê peyvên ku avûkat gotin, guhdarî kir. Ew tiştên ku Hemîdo û avûkat U ser peyivî bûn û avûkat gotibû, ku ew ê di mehkemê de bibêje, wî yek ji wan jî negot.

Bi wî awayî, bi biryara mehkemê, heft sal ceze li lawê Hemîdo hate birîn.

Hingî Hemîdo bû weke dêhnan, hêrs bû û lerizî. Mûyê canê wî li wî gij bûn, çavên wî fireh, mezin û sor bûn. Mirov digot a wextî çavên wî ji nava serê wî bipengizin. Wî destê xwe hêdîka bir ser kêra di bêrika xwe de û wextî êrîşî avûkat bikira. Lê nekir, piştî ku awirekî sert û tûj avête avûkat, li lawê xwe zîvirî û bi dengekî nîvhêvî got:
- Ez bavê te me, tu hîç meraqan meke! Eynî ez zanibim ku wê serê min jî tê de here, ez ê te xelas bikim. Tu li xwe miqate be lawê min!

Lêwik xwest tiştêkî ji bavê xwe re bibêje, lê eskeran nehiştin, bi milên wî girtin û ew kişandin hundur.

43

DIYAMIHO

Wan du caran li derî xistin, cara sisiyan gava derî venebû, bi pehînan û bi qundaxên tivingên xwe derî şikandin û ketin hundur. Pîrê di quncuka xênî de, di nav nivînê xwe yê gemarî û pînekirî de razayî bû. Herdu leşker çûne ser. Yekî ji wan lingê xwe li lihêfa ser wê xist û bi qîrîn got:

- Heydê, zû!. . . Ger tu lawê xwe tînî bîne, ger tu naynî em ê te ji berdêla wî bibin.

Pîrê bi dengê xwe yê jar û ketî bersiv da:

Bavo, Welleh ez nizamim lawê min li ku ye. Ev serê du mehan e çavên min li wî neketine.

Leşker bi ser de qîriya:

- Hiş be, derewa meke... Ev çend car in ku tu me bi van derewan dixapînî. Ger tu cihê wî dibêjî bibêje, ger tu nabêjî, rabe, bide pêşiya me!

Ev deh rojên pîrê bû ku nexweş bû û di nava nivîna de bû. Qermîçokên rûyê wê hîn bêtir qermiçî bûn. Çavên wê kort bûbûn û destên wê dilerizîn.

Leşkêr dîsan lingê xwe li nivînê wê xist û got:

De, zûka cihê wî xayinî bibêje!

Pîrê tu tişt negot, weke zarokan kire îskîn û hêsirên wê bi ser hinarîkên wê ên qermîçokî de hatin xwarê.

Îcar leşker pehînek li zikê wê xist û bi set de qîriya. Leşkerê din li çavê wî nihêrî, hêrs bû û lerizî, lê tu tişt negot.

Gava wan Pîrê derxistin der, hemû gundî li meydana gund hatibûn civandin. Wan dehfek dane Pîrê û ew ber bi koma gundiyan ve şandin. Pîrê herdu destên xwe dane ser hev û kete rêza gundiyan. Lê ew nikanîbû di cihê xwe de rawestiya. Dest û çongên wê wilo dihejiyan, ku mirov digot a wextî ew were xwarê.

44

Serçawîş destên xwe dane paş qûna xwe û du-sê caran di ber rêza gundiyan re çû û hat. Dû re ew li gundiyan zîvirî û bi dengê gur, Dê û bavê Miho bila derkevin vir! got û bi destan meydan nîşan da.

Pîrê weke ku bikule, xwe da ser darê xwe û ji nav rêza gundiyan derket.

Serçawîş ber bi wê çû û bi hêrs got:

Kanî lawê te?

Baş deng neçû Pîrê. Ji wê webû ku serçawîş li mêrê wê dipirse.

Bavo heyrano, ev deh salên mêrê min e ku çûye rehetê.
Serçawîs wilo têgihîşt ku Pîrê wî dixapîne, pehînek li darê wê xist
û got:
Ez ji te re dibêjim, kanî lawê te?
Gava serçawîş pehîn li darê Pîrê xist, Pîrê kete xwarê û li erdê berê
xwe bi gundiyan ve kir û got:
Bavo, ma we kê Mihokê min dîtiye? Kî ji we dizane bê Miho li
ku ye? Îcar serçawîş darê Pîrê ji dest girt, bi rêzê li gundiyan xist û
got:
Miho! Miho! Hûn cihê wî dibêjin bibêjin, an na ez ê we gişan
bişewitînim.
Hingî Mistiko ji nava rêza gundiyan derket. Navê wî yê rastî
Misto bû. Lê ji ber ku ew feqîrê gund bû, hemû gundiyan jê re digotin
"Mistiko". Mistiko tiliya xwe li ba kir û gpt:
Tu me hemûyan dişewitînî bişewitîne! Em cihê Miho nizanin!
Serçawîş emir da du leşkeran:
Bi milên wî bigirin û wî biavêjin makînê!
Leşkeran tifingên xwe ji milên rastê avêtin yên çepê û bi milên
Mistiko girtin, birin avêtin cemseke leşkeran.
Serçawîş çend xort ji nava rêza gundiyan veqetandin, bi qundaxa
tinga xwe li wan xist û got:
Cihê Miho ji me re bibêjin! Ger hûn naxwazin bêne girtin û
45
bêne kuştin, zû cihê wî ji me re bibêjin.
Xortan xwe li nezaniyê danîn:
- Em cihê wî nizanin.
Pênc-şeş leşker li wan civiyan, ew dane ber kulm û daran, ew
avêtin erdê û bi pehînan kişiyên ser zikên wan.

Pîrê xwe avêt ber lingên wan û li ber wan geriya. Serçawîş pehînek lê xist û got:

- Bimire Pîra heram! Miho! Miho!... Divê hûn cihê wî bibêjin, hûn cihê wî xayînê welêt bibêjin.

Pîrê îcar xwe avêt lingên wî yên bi potîn û got:

- Bes e, qe bila wijdan bi te re hebe!

Serçawîş du pehînen din jî lê xistin û got:

- Wijdan!. . . Min ji we re carekê gotiye, ku hûn cihê Miho ji me re nebêjin, ez ê we hemûyan bişewitînim. Ez ê malên we bi ser we de xerab bikim...

Dû re serçawîş emir da leşkeran, da ew li gundiyan bbcin. Piştî ku wan bi dar û qamçiyên gundî ji hal de xistin, xwestin ku wan gişan biavêjin makînan û bibin.

Pîrê nihêrî ku rewş xerab e, ji bo ku ew gundiyan xwe xelas bike, tiştên ku li ber guhên wê ketibûn, got:

- Bisekinin, bisekinin! Dev ji gundiyan berdin, ez ê cihê Miho bibêjim.

Hingî serçawîş û hemû leşker sekinîn û berê xwe bi wê vekirin.

- Lawê min çû ye Bêrûdê. Berî niha bi mehekê min xeber girt, ku ew li Bêrûdê ye.

Serçawîş bi şaşmayî:

- Bêrûdê?. . . Ew çû ye nava Filîstîniyan ha!. . .

Du leşkeran bi milên Pîrê girtin û ew avêtin dawiya tirimpêlê.

Dû re hemû leşkeran xwe avêtin makînen xwe û ji gund derketin.

46

XEWNANE BLXER

Ew bi dengê teqîna tivingan re hişyar bû, herdu çavên xwe firkand, ji nava nivînan rabû û baz da hewşê. Gava ew çav li leşkeran ket, dîsan

bi paş de baz da hundur.

Jina wî û herdu zarokên wî di xew de bûn. Mêrik çû ber pacê, hêdî perde da alî û li derve nihêrî. Wî dît ku komek mirov li meydanê hatine civandin, destên wan li ser serê wan in û di nava xelesa leşkeran de ne. Mêrik dîsan hêdî perde weke berê kir û li hundur vegeya.

Jina wî mîna ku mirov zixtikan lê bixe, ji nava nivînan pekiya, xwêdana ser çavê xwe pakij kir, bi tirs û bi heyecan ji mêrê xwe re got:

Min çî xewnek ne bi xêr didît.

Lê wê xewna xwe ji mêrê xwe re negot.

Mêrik li ber serê wê, li ser tûtikan rûnişt û jê pirsî:

Xêr e însaleh, te çî xewn dîtiye?

Jinikê axîneke kûr kişand û got:

Tu bi a min bikî ez nabêjim.

Mêrik îcar hebekî bi hêrs got:

De ka bibêje ha! Xêr e, ma te çî xewn dîtiye, ku te evqasî xwêdan daye? Tu hertim xewnên wilo tewlo mewlo û ecêb dibînî.

Xwedê zane tu dîsan di ser çîyan miyan re difiriyayî.

Mîna ku mirov satilek av bi ser jinikê de rijandibe, ew ji xwêdanê şil bûbû.

Na malxerabo, min xewn dît ku eskeran tu dikuştin.

Hingî bi carekê ve çokên mêrik sist bûn, canê wî sar bû û xwêdaneke cemidî ew girt. Tevzî li ser tevziyê li dilê wî ket û tirs mirinê

lê peyda bû. Ew pênc salan xwînî û li çîyan mabû, lê tu caran tirsên

47

wilo li wî peyda nebûbûn.

Dû re wî bi dengê nîvqurmiçî ji jina xwe re got:

Ma tu dizanî ku leşkeran girtine ser taxê, ew wextî bigirin ser mala me jî.

Ji tirs û heyecanê zimanê jinikê negeriya, di cihê xwe de sar ma.

Mêrik dîsan got:

- Keçê, Weleh xewnên te carinan rast in ! Te wê dema han xewn dît, ku cîranê me Xelo miribû, sibehê em rabûn, me dît ew bi rastî jî mirî ye. Ev xewna te jî ne rast be? Weleh ez jî çer ku vê sibehê çav li wan ketim, tirsî mirinê kete dilê min. Ez bi rastî jî neyême kuştin?

Jinikê bi dengê hebekî bilind got:

Hela hiş be, bila devê te ji xêrê vegere gidî ! Ma çî ye tu vê sibehê qala mirina xwe dikî? Ev çî sibeheke ne bi xêr e!

Mêrik bersiv neda, keserek kûr berda û cigarek pêxist. Piştî ku hebekî fikirî, ji jina xwe re got:

- Rabe, zû ji min re destak kincên xwe derxe, leşker wextî bigirin ser me. Weleh ku îcar ez bême girtin, berdana min tune ye, ew ê min îdam bikin.

Jinik zû ji nava nivînê xwe pekiya û ber bi sindoqa xwe ya kincan çû. Wê kiras û derpiyekî dirêj û hubiriyek jê derxist û anî danî ber mêrê xwe.

Mêrik qederekî li wan kincan nihêrî. Paşê dîsan rabû ser xwe, çû hebekî perde da alî û li derve nihêrî.

Yên girtî hîna jî destên wan li ser serên wan bûn û di nava xelesa leşkerên bi sîlah de di rêzê de bûn.

Mêrik perde bi hêrs berda û dageriya hundur. Wî zû ew kincên li erdê li xwe kirin, çû ber neynikê û li xwe nihêrî. Piştî dît ku kinc lê hatin, jina xwe hemêz kir, zaroka xwe ya di xew de bê ku hişyar bike, maçî kir, rahişt du satilên avê û derket. . .

GIRTÎ

Ev tam meheke wî çêbûbû ku ew hatibû girtin û di nezaretxanê de bû. Ji lêdan û îşkencê mirov ew nas nedikir. Porê wî û riha wî ya xelekî rûyê wî yê zeyif winda kiribû. Ji xwe mirov digot qey devê wî tune ye. Simbêlê wî ser herdu lêvên wî girtibû û daketibû heta bi ser çenga wî. Ji por û riha wî, serê wî ji gewdê wî mezintir xuya dikir. Bi wî awayî wî destê xwe bi hêz li deriyê hesinî xist da ku hinek jê re derî vekin û here daşirê.

Wî du sê caran wilo li ser hev li dêrî xist, lê kes pê ve nehatin. Dû re wî destên xwe avêtin şîşên derî, pê girt, bi hemû hêza xwe hejand û bang kir. Bi dengê wî re herdu polîsan li çavên hevdu nihêrîn. Yekî ji wan araqiya ku di şûşê de mabû bi ser xwe de kir û rabû ser xwe. Lê rabûn û ketina wî bû yek. Hevalê wî rabû, ku wî ji erdê rake, lê ew jî wilo dihejiya ku mirov digot, a wextî ew jî bikeve. Lê wî xwe girt û neket; bi herdu milên polîsê ku ketibû, girt, hejand û bi dengê ne zelal (mîna dengê serxweşan) got:

Rabe, here xwe li ser qoltixan dirêj bike.

Polîsê ku li erdê bû, weke ku vereşe qirpika wî hilat. Bi pişta destê xwe simbêlê xwe paqij kir û wî jî bi dengê serxweşan got:

" Te got çî?. . . Ma ji tirê ez serxweş im? Ez ne serxweş im haa!. . .

Erê, erê, tu ne serxweş î! Lê rabe here xwe bîskê li ser qoltixan dirêj bike!

Dû re ew hejiya û wextî biketa, lê neket û bi hêrs ji polîsê ku ketibû xwarê re got:

De rabe ha! Lawo tobe be, ku ez careke din bi te re araqiyê vexwim!

Yê ku li erdê bû, weke ga kire ûrînî:

Ji te weye ez serxweş im ha!

Ew bi hêz ji erdê rabû; gava rabû, çokên wî hejiyan û wextî biketa. Lê yê din kete bin milê wî, ew bire daşirê, serê wî da ber ava cemidî û şuşt. Piştî ku wî serê xwe dawşand, got:

- Yaho bi rastî jî vê mîrata araqiyê tesîr H min kir. Min digot qey ez tu caran nakevim.

Yê girtî ji serî heta binî li wan guhdarî dikir. Wî dîsan li derî xist ûgot:

Derî vekin! Derî vekin ez herim daşirê, min bi xwe de mîst! . .

Hingî polîsekî ji dê û jina wî re xeber da, lê deng neçûyê, ji ber kudeng hebekî jidûrvedihat.

Yê girtî her li derî dixist. Yek ji nava polîsan di daşirê de vereşiya. Piştî ku devê xwe şuşt, çû û xwe li ser qoltixan dirêj kir. Yê din jî rahişt meqesê, ber bi nezaretê ve çû, da ku ji xwe re bîskê bi yê girtî bileyize û por û riha wî bide ber meqesan. Gava wî deriyê nezaretê vekir, gêj bû, şewişî, ket û dîsan rabû. Hema ku rabû, meqes avêt porê girtî. Wî du-sê caran wilo li ser hev meqes avêt por û riha yê girtî û her carê jî gulokek ji serê wî tanî xwarê. Lê gava Girtî fêhm kir, ku ew bê hêz e, heya ku jê hat kulmek di paş stûyê wî de lêxist. Bi kulma wî re polîs hejiya, çavên wî çûn û hatin û li ser piştê li erdê ket. Pêşî Girtî hebekî tirsîya, dû re serê xwe hêdî derxist derve û li hundurê polîsxaanê nihêrî. Paşê dîsan ew li nezareta xwe veşerîya, bi tirs û heyecan ji xwe re li riyeke bazdanê fikirî. Paşê ew daqûlî ser polîsê ku li erdê dirêj kirî bû û zû zû kincên wî jê kirin. Wî pêşî çakêt jê kir, dû re pantor û ji xwe şewqê wî jî berê ji serê wî ketibû. Ji bo ku ew wext winda neke, tavalê kincên xwe ji xwe kirin û kincên ku ji polîs kiribûn li xwe kirin. Piştî ku wî kincên polîs li xwe kirin, di dilê xwe de got: " Xwezî niha neynikek li vir hebûya û min li xwe binihêriya". Dû re wî şewqe jî da serê xwe. Mirov digot qey

ew kinc bi taybetî ji bo wî hatibûn çêkirin, tam li gorî wî hûn. Lê ji ber ku ew ji lêxistin, îşkencê û birçîbûna zeyif bûbû, ew kinc hebekî jê re fireh dihatin.

Dû re wî bi herdu destên polîs girtin û weke ku mirov berateyekê 50

bikişîne, ew kişand qorziya nezaretê û li lêdana dilê wî guhdarî kir. Dilê wî hê jî lêdixist.

Bi carekê ve ramenek hate yê girtî. Hema rahişt wê meqesa li erdê , bi riha xwe ket û qusand. Di kêlîkekê de wî riha xwe qusand. Dû re hêdîka deriyê nezaretê li ser polîs girt û derket. Ji dengê xirîna polîsê ku li ser qoltixan raketibû pê ve, tu deng ji hundur nedihat. Girtî hêdî di ber wî re derbas bû û derket derve. Ew tevlî tarîtiya şevê bû û bi gavên xurt lezand. . .

5i

KURMÊ DARE JT DARÊ YE

Gava bavê Kotan diya wî berda û ji gund bar kir, Kotan hê du salî bû, bîra tiştê nedibir. Lê, ew niha mezin bûbû, bûbû çardeh salî. Ji zilma ku dêmariya wî lê kiribû, çavên wî venedibûn. Mirov destê xwe li ber çavên wî bihejanda, bijankên wî diçûn û dihatin û paşê çavên wî dihatin girtin.

Êvarekê, gava ew kete nava nivînê xwe, xewa wî nehat. Wî xwe vir de livand, wê de livand, lê kir û nekir xew nekete çavan. Ew hebekî jî birçî bû, lê nerazana wî ne ji birçîbûna bû. Ji ber ku ew pir caran weke îşev birçî mabû, lê dîsan jî raza bû. Lê îşev. . . Çima ew nikanîbû îşev raketa gelo? Te digot qey marek di nava nivînê wî de bû; fikir nedikir xewa wî nedihat. Paşê wî herdu destên xwe xistin bin serê xwe û li zikê odê nihêrî.

Gelo ji bo çî vê jinikê her dem jê re xeber dida, gotinên nemayî jê

re dikirin û bi ser de diqîriya?

Zilma bavê wî û ya dêmariya wî eynî mîna fîlmekî sînemayê dihate ber çavên wî.

Wî êdî debar nekir, destê xwe yê rastê ji bin serê xwe kişand, bi hêrs li eniya xwe xist û çavên xwe fitkandin. Paşê bi dengê nizim xwe bi xwe got:

- Wilo xuyaye tiştên ku têne gotin rast in, ev ne diya min e. Ger ev diya min bûya, wê mîna dayikan bi min re bida û bistanda, wê wilo her car bê sebeb li min nexista û erza min neşikanda. Divê ez diya xwe bibînim, ez herim ba wê.

Temenê wî bûbû çardeh sal, lê hê jî nizanîbû bê bi rastî ev diya wî ye, an jî dêmariya wî ye. Tiştên ku li ber guhên wî ketibûn jî wî

Si guh nedabûyê. Edî ji qehra êş kete serê wî. Ew ji bo kişandina cigareyekê hêdî ji nava nivînê xwe rabû û çû odeke din. Wî ji tirsê lampe vênexist, bi destpelînkê çû. Destê xwe li hundur, li cigara bavê xwe gerand. Piştî ku ew li ser masê û li ser qoltixan geriya, paşê çû ber dolabê, çavîka wê kişand û destê xwe li hundurê çavîkê peland. Hingî pakêteke cigare û tiştê giran kete destê wî. Ew tiştê giran çi bû gelo? Wî destê xwe yê din jî dirêjî wî tiştî kir û ji çavîkê hilda jor. Ji ber ku hundur tarî bû, ew çû ber pacê û lê nihêrî. Gava fêhm kir ku ew debançe ye, laşê wî bi carekê ve sar bû, çavên wî fireh bûn û lerizî.

Êdî wî diviyabû serê xwe bilind bikira. Diviyabû diya xwe ya qehpik bikuşt. Eynî ew li perê esmên bûya jî, diviyabû lê bigeriya, ew bidîta û bikuşt. Piştî ku qederekî li ser lingan fikirî û xeyal anîne ber çavên xwe, paşê bi qulûsî derket derve.

Derive rohnî bûbû, bûbû destê sibehê. Gelo ew ê bi ku de biçûya?

Gorî peyvên ku li ber guhên wî ketibûn, dê diya wî li gundekî çiyê bûya. Lê bi sedan gund li çiyê hebûn. Wî dê berê xwe bida kîjan gundî û bi ku de biçûya? Ew çiqas fikirî nefikirî wî tu rê ji hev demexist. Dawî ew kete kuçeyekê û lezand.

Di rê de xwe bi xwe got:

- Hema ez ji malê bi dûr bikevim, bila qet ez gund jî nebînim.

Ez ji zilma malê xelas bibim besî min e.

Gava ew ji nava bajêr derket, dinya hîn rohnîtir bû. Wî êdî dizanîbû ku sibe ye. Ew pir kêfxweş bû. Wî destê xwe xiste bêrîka xwe û pakêta cigarê derxist. Cigarek ji pakêtê derxist û vêxist. Her ku wî hilmek li cigarê dixist, mîna dixana sobeyekê dbcan bi ser serê wî diket. Bi çend hilman wî ew cigare qedand. Wî xwest ku ew cigareke din jî bikişîne, lê hew dikanîbû, ji ber ku serê wî gêj bû û dilê wî li hev ket. Wî du-sê caran li ser hev tifikir û lezand.

Riya ku ew tê re diçû ne riya tirimpêlan bû. Tirimpêlên ku di wê 53

riyê de diçûn û dihatin an traktor bûn, an jî motorbîsîklêt bûn.

Carna jî gava leşkeran ji xafil de digirtin ser bajêr, hin tirimpêlên wan di wê riyê de dihatin.

Tirsa Kotan ya herî mezin leşker bûn. Ger leşker lê rast bihatana, dê muheqeq jê bipirsiyana bê ew ji ku tê û bi ku de dihere. Ji ber ku leşkeran gelek caran girtibûn ser bajarê wan. Vê dawiyê wan ji xafil de girtibûn ser dibistanan jî. Carekê, gava leşkeran girtibûn ser dibistana Kotan, Kotan û du zarokên hevalên xwe hatibûn girtin. Hingî du pirtûkên mamosteyê wî bi wî re hatibûn girtin. Wî ji ber lêxistin û îşkenca leşkeran debar nekiribû û gotibû: "Ev pirtûk ne yên min in, ew yên mamostê min in". Ji ber ku temenê wî biçûk bû ew hatibû berdan. Dû re mamostê wî hatibû girtin û ceze xwaribû.

Gava lêdan û îşkenca ku leşkeran lê kiribûn dihate ber çavên wî, ew dilerizî, xwîna wî disekinî. Ji bo ku ew li leşkeran rast neyê, ew çolbeyar diçû. Piştî ku qederekî meşiya, êdî kete ser riya gundekî û lezand. Tiştên ku li ber guhên wî ketibûn, dê diya wî li gundekî nêzîkî bajêr bûya.

Ji dûr ve reşekî xuya kir. Kereke bi bar di ber de bû û ber bi bajêr ve dihat. Gava nêzîkî li hev kirin, mêrik destê xwe yê rastê hilda jor û silav da Kotan. Kotan jî eynî mîna wî destê xwe hilda jor û silava wî lê vegerand. Mêrik ji Kotên pirsî:

- Biraziyê delal, gelo agirê te heye?

Kotan bi herdu destan bêrîkên xwe pelandin û bersiv da:

- Erê apo, agirê min heye.

Çixat dirêjî peyê kir.

Ev rêwî, barê wî êzing bû. Emrê êzingvan li dor heftêyî bû. Kincên wî pertal pertalî û solên wî pînekirî bûn. Riha wî ya spî rûyê wî xemilandibû. Wilo xuya bû ku ew westiya bû. Piştî ku wî cigara xwe vêxist, ji Kotan pirsî:

- Birazî, ger ecela te tune be, em rûnên, bi hev re cigarekê bikişînin?

54

Kotan li rewşa wî nihêrî û bi devkenî bersiv da:

- Ecela te tune be, ya min tune ye apo !

Kalo jî keniya:

- Eh. . . Wê çaxê baş e, em ê bi hev re cigarekê bikişînin.

Wî kera xwe li qiraxa rê, bi gomeyekî ve girê da û herdu li hev rûniştin. Gava kalo rûnişt, canê wî kire qirpeqirp û ji Kotên re got:

- Ohh. . . birazî, halê me halê kûçikan e. Em di van riyan de mirin,

em riziyan. (Destê xwe ber bi kera xwe ve dirêj kir) Ha tu dibînî,

ji bo barek êzing em di ser çar gundan re tîn. Hemû jî ji bo kîloyek

şekir e, an jî ji bo kîloyek rûn e. Carinan jî hinek hene ji wan re dibêjin "Ormancî". Rehim di dilê wan de tune ye. Ew hem barê êzingên me ji me distînin, hem jî werîsên me diqetînin.

Kalo hem dipeyvî, hem jî cigare dipêça. Di wê navberê de Kotan cigare keremî wî kir. Kalo cigare ji destê wî girt û got:

- Ooo. . . cigarên biraziyê min bi qûnik in.

Wî destê xwe dirêjî pakêta di destê Kotan de kir û ziq lê nihêrî.

Piştî ku qulupand vî alî û wî alî, dû re da Kotan.

Kotan fêhm kir û got:

- Ev cigare ne ya min e, apo! Tu nebêjî qey ez cigarekêş im û cigarên wilo dikişînim. Ev cigare ya bavê min e.

Mêrik keniya:

- Divê bavê te dewlemend be ku bikaribe cigarên wilo bikişîne.

Ev cigare pir biha ne, birazî! Paşê ji Kotan pirsî:

- Wilo xuyaye tu bajarî yî. Tu ji vê Nisêbîna me yî, an ji bajarin dinî?

Kotan:

- Ez ji Nisêbînê me apo, got.

- Tu ji Nisêbînê yî?

- Erê, ez ji Nisêbînê me, Kotan dîsan got.

Piştî ku kalo axîneke kûr kişand, got:

- Bênamûsekî gundiye me jî li Nisêbînê rûdine. Bênamûs di ser wî re tunene. Gelo tu li kîjan taxê rûdinî?

55

Kotan navê taxa xwe jî got.

- Hah... ew bênamûs jî li wê taxê rûdine, kalo got. Ew dewlemendê gund bû. Hema hema erdê gund hemû di destên wî de bûn. Lê niha tenê çend perçe erdê wî mane. Yê din hemû firotin

gundiyan û gundî xistin bin deynê xwe. Pasê ew çû bi bavkûçikeke weke xwe re zewicî û ji bo wê jina xwe berda. Qebhet xiste stûyê rebenê, tiştên nemayî bi serê wê de anî. Hê zaroka wê li dest bû, zarok ji dest girt û ew bi serê wê hişt. Ma çi jin birazî, çi jin!. . . Weleh milyaket e, milyaket. . .

Kotan fêhm kiribû ku kalo qala bavê wî dike. Mûyên canê wî lê gij bûbûn, çavên wî beloq bûbûn. Gava ew hêrs dibû laşê wî dixuriya, xwêdan dida û dilerizî. Niha jî li wî wilo hatibû. Ji hêrsan nikanîbû di cihê xwe de rawestiya. Hema wî li devê kalo dinihêrî, dixwest kalo tişteki din jî bibêje.

Kalo hew peyivî, destên xwe dane ser çokên xwe û xwest ku rabe, lê Kotan nehişt û got:

- Apo, cigareke din jî bikişîne dû re here. Ê cigare keremî kalo kir.

Kalo cigare jê girt, vexist, du hilmên kûr li ser hev li cigarê xistin û dûxan di dev û pozê xwe de berda.

Çavên Kotan hema li devê wî bû, dixwest ew tişteki din jî bibêje, dixwest qala tişteki din jî bike. Lê peyv ji kalo derneket; wî hilm li ser hilmê li cigarê dixist û dihizirî.

Ji bo ku Kotan wî bipeyivîne, jê pirsî:

- Eê. . .apo! Ma îcar ew peya nayê gund carina?

Mêrik wa bi keder serê xwe ber bi jêr ve hejand:

- Belê, ew dihate gund. Ew pir caran li ser hev dihate gund. Lê niha ew evqas nayê. Sedemê nehatina wî jî em pê nizanin. Berê her ku dihat mala gundiyeke dişewitand. Lê niha gundî dibêjin newêre. Ji ber ku par, gava hatibû gund, sê xortên me yê xwende çûbûn bi wî re peyivî bûn. Piştî munaqêşa wan hin xirecir di navbera wan de derketibû. Gava ew beraz vedigere bajêr, esker û polîsan dişîne

ser gund û hersê xortan dide girtin. Yê min ez nizanim, lê hin gundî dibêjin ew "muxbir" e. Wî geleeek xortên vî gundî dane girtin, geleeek... Haa! Min çi digot? Lê, hin gundî dibêjin newêre. Dibêjin, xwendevanan li bajêr ew tirsandine, ji bo vê newêre. Bi saloxan ew bênamûs tim li qereqol mereqolan e.

Edî nexwest zêde bipeyive. Ji ber ku roj bilind dibû. Gava ew di wextê xwe de negihîştta bajêr, wê barê êzingên wî di stûyê wî de bimaya. Ew rabû ser xwe, destê xwe yê rastê li milê Kotên xist û got:-
Lê, birazî... Dibêjin, kurmê darê ne ji darê be dar narize. Ev peyveke rast e. Kurmê darê ji darê ye.

Ûwî xatir ji Kotan xwest, bi pişta xwe ya tewiyayî da dû kera xwe û hêdî hêdî ber bi bajêr ve meşiya.

Gava ew çû, Kotan cigareke din jî pêxist û kişand. Ew bi cigarekişandinê re fikirî. Gelo dê niha çi bikira? Tiştê ku ew berê lê fikirîbû, niha dibû berevajiyê wê. Bi dengê bilind û bi hêrs got:
- Rast e, bavê min muxbir e !. . .

Ji xwe berê jî şika Kotan jê çêbûbû. Rojekê, gava wî hin pirtûk anîbûn malê, ji bo wan pirtûkan lêdana ku bavê wî lê kiribû, mirov li keran nedikir. Carekê jî, gava ew û du hevalên xwe di ber mala wan re derbas bûbûn, hevaleyê wî bi tiliya xwe mala wan nîşan dabû û gotibû:

Ha hûn vê mala han dibînin, ev mala Hemoyê muxbir e. Hemû heval pê dizanin ku Hemo muxbir e û her roj li polîsxa nê ye. Lê lêwik nizanîbû ew mala Kotan bû. Tiştên ku hatibûn ber devê wî, wî gotibûn. Hingî Kotan dev li lêva xwe ya jêr kiribû û bêdeng mabû. Lê şika Kotan ya herî mezin ji vê çêbûbû. Telefonên ku ji bavê wî re dihatin an ji polîsxa nê bûn an jî ji qereqola eskeran bû.

Vê yeka han di serê Kotan de cih girt. Diviyabû wî îcar awayek bikira. Diviyabû wî îcar serê xwe bilind bikira. Bi ya wî serbilindahî îcar di vê de bû. Pêşî xwest ku vegere bajêr, çîrokê ji hevalên xwe yên komelê re bibêje, lê rameneke din hatiyê û xwest ku ew vê problema han bi serê xwe çareser bike.

57

Kotan ber bi gundê diya xwe ve lezand. Diviyabû wî diya xwe bidîta. Edî roj bi qamekê bilind bûbû. Tava rojê paş stûyê mirov dişewitand. Kotan di ser gundekî re derbas bû. Gorî ku kalo gotibû, diviyabû wî sê gundên din jî derbas bikira. Hin traktor di rê de diçûn û dihatin, lê Kotan destê xwe ji wan re bilind nekir û ew nedane rawestandî. Bi kurtayî wî nedixwest ew bi kesekî din re rûne û bipeyive. Li rêwiyan ku rast dihat jî, tenê silav li wan dikir û ji wan derbas dibû.

Berî ku roj here ava, wî nêzîkî li gund kir. Lê ew neçû gund. Ew çû ser qîşîkê hemberî gund û li bendî kalo rawestiya. Wî zanîbû ku dê kalo îro vegere malê. Kalo têketa kîjan malê, mala di rex mala kalo de, mala diya wî bû.

Bi tarîketinê re wî dît ku kalo li kera xwe siwar e û dikeve gund. Kotan çavên xwe ji kalo neqetandin. Wî dît ku kalo kera xwe ajot hundurê hewşekê. Xaniyê kalo bi keviran hatibû lêkirin, nizim û xerabeyî bû. Li hewşê kûçîkek û çêlekek hebû. Li ser xênî jî gundorekî spî xuya dikir.

Mala di rex mala kalo de jî, nola mala kalo bû. Lê tu çêlek li hewşê tunebû. Tiştên ku li hewşê dihatin xuyakirin baş nedihatin dîtin, lê mirov hema hema dizanîbû ku mirîşk in. Piştî ku baş tarî kete erdê, Kotan xwe berda gund. Ji tirsê kûçîkê kalo ew di paş xênî re çû, kete hewşa diya xwe û çû li ber derî guhdarî kir. Dengê bi

nalîn ji hundur dihat:

Lê lê, pepûkê! Lê lê, porkurê!. . .

Wey bê hevalêê, wey bê hogirê!

Ma ev qeder bû hate serê te?

Li te perçe kir gurçik û dilê!

Kotan debar nekir û sê-çar caran li ser hev li derî xist. Diya wî bi carekê ve dengê xwe birî û bazda derî vekir. Gava derî vebû, Kotan xwe bê rohnî avêt hemêza wê. Jinik şaş ma. Ji wê webû ku Kotan
58

dest davêje wê. Hema wê Kotan ji xwe veqetand û dehfek da wî. Bi dehfa wê re pişt Kotan li dîwêr sekinî. Ji ber ku ew nêzîkî lampê bû, rûyê wî baş dihate xuyakirin.

Devê diya wî ji hev mabû, wê tu caran tiştê wisa nedîtibû. Ev xortik jî ne ji vî gundî bû. Destên wê li ser pêsîrên wê bûn û ber bi Kotan çû. Wê ji şanika ber pozê wî ew nas kir. Heta ku jê hat wê xwe avêtîyê. Hema ku dera wî kete ber wê, wê maçî dikir û digot:

- Loo, Kotan! Bavê diya xwe, bavê min... Berxikê diya xwe...

Ruhê min... Maşaleh, maşaleh, maşaleh... Maşaleh lawê min bûye zilam.

Wer ku diya wî ew maç kir û ew hemêz kir, demança wî ji ber wî ket. Gava diya wî demançe dît, çavên wê beloq bûn û got:

- Welleh ez bêşûc im. Welleh gunehê min tune. Welleh bavê te qebhet xiste stûyê min. . . Ha min bikuje! Ger tu bi ya bavê xwe dikî min bikuje. Ji xwe mirin ji vê rewşa min çêtir e. Ma qey te nebihîst Kotan! Ma te nebihîst bê bavê te çi aniye serê min? Aaxx...

Aaxx... axxx!...

Bi herdu destan li sînga xwe dixist û digot:

-Min bikuje!...

Kotan rahişt debançê, xist ber xwe, xwe li diya xwe pêça û got:

- Yadê, ez dizanim. Bes e! Bes bike lavelav. Ne hewce ye ku tu bibêjî, ez dizanim. Ez bi hemûyî dizanim.

Piştî ku ew qederekî bêdeng di hemêza hevdu de man, Kotan dîsan peyva xwe dom kir:

- Dayê, em ê herin. Em ê herin bajarekî dûr, bajarekî mezin...

Ez ê te ji vê rewşê xelas bikim. Em ê herin!. . .

Hingî ruh bi jinikê ve hat. Wê fêhm kir ku niyeta Kotên ne xerab e. Ev tam donzdeh sal bûn ku wê lawê xwe nedîtibû. Ji kêfan hêsirên wê bi ser hinarîkên wê de dihatin xwarê. Geh wê ew hemêz dikir, geh maçî dikir. Piştî ku bêhna wan hate ber wan, êdî diya wî dest bi çîroka xwe û bavê wî kir. Her tişt ji serî heta binî jê re got.

Ma tiştên ku kalo gatibûn jî peyv bûn? Ew li ber tiştên ku jinikê

59

digotin ne tişteke bûn. . .

Kotan bi soza ku ew ê di demeke kurt de bi ser diya xwe de vegere, bi bayê bezê û bi hêrs ji mal derket û ji gund bi dûr ket.

60

BÎSÎKLÊT

Gava Remo êvarî ji dibistanê vegeriya malê, kêfa wî ne lê bû, çentê di destê xwe de avête ser masê û li quncikeke xênî rûnişt.

Bavê wî jê pirsî:

- Dersa te îro çawa çû, lawê min?

Lêwik lêva xwe daliqand, milên xwe hejandin û tu bersiv neda.

Bavê wî dîsan jê pirsî:

Ez ji te dipirsim, lawê min, dersa te çawan çû?

Remo dîsan tu bersiv neda, serê xwe xiste ber xwe û fikirî.

Îcar bavê wî bi hêrs û bi dengê gur bi ser de qîriya:

Ez ji te re dibêjim, ker lawê keran, ma qey deng nayê te?

Remo tu bersiv neda, ji tirsan kirî baz da, lê dîsan baz neda; lêva xwe daliqand û di cihê xwe de bêdeng ma.

Piştî ku demek di navberê re derbas bû, diya wî şîv anî û li ser sifrê danî. Kêfa Remo pir ji wê şîvê re dihat, lê kir û nekirin wî nexwar. Îcar diya wî jê pirsî:

- Çi ye lawê min, ma 'çi bûye? Qey dersdarê te bi te re xeyidiye?

Remo dîsan jî bersiv neda, serê xwe vir de û wê de hejand û bêdeng ma.

Bavê wî rabû ku lê bixe, lê diya wî nehişt, ew dîsan da rûniştandin û got:

- Çi ye tu evqas bi ser lêwik de diqîrî? Hela bisekine, qey derdekî wî heye!

Mêrik bi derdê wî dizanîbû. Ji jînikê re got:

Ma qey tu bi derdê wî nizanî? Derdê wî bisiklêt e, bisiklêt. . .

Berî ku ew malê bar bikin bajêr, bavê wî jê re soz dabû, ku ew malê bar kin, ew ê jê re bisiklêtekê bikire. Li gund, gava carekê Re-61

mo bi bisiklêta lawê axê leyistibû, lawê axê lêxistibû û serê wî şikandibû.

Bavê wî jî jê re gotibû: "Lawê min, jehr di bisiklêta lawê axê de be, mere cem wî. Gava em malê bar kin bajêr, bi soz ez ê ji lawê xwe re bisiklêtekê bikirim, bisiklêteke ku bi deh qatan ji ya lawê axê xweşiktir û spehîtir!" Lê tam saleke wan çêbûbû ku wan mal bar kiribûn bajêr. Gava Remo ji bavê xwe re digot:

- Bavo, ma kanî soza te? Ne te got, em malê bar bikin bajêr, ez ê ji te re bisiklêtekê bikirim?

Bavê wî jî pê re dixeyidî û digot:

- Kuro ma ez ê bi kenê xwe ji te re bisiklêtan bikirim? Ma tu

rewşa me nabînî?

Lawik jî ji qehran digiriya.

Îcar diya wî li ber wî geriya û got:

- Erê lawê min, hela tu were şîva xwe bbrwe, em ê dû re li ser bipeyivin.

Remo kelogirî bû:

- Na Weleh, hûn dîsan nakirin. Hûn tim dibêjin, em ê li ser bipeyivin û hûn nakirin.

Bavê wî bi dengê hebekî bilind got:

- Niha ew jehrtêketiyên bisiklêtan bi çiqasî ne?

- Bi sed û pêncî lîrayî ye, Remo bi dengê nizim got. Dibe ku li cem Forsonê erzantir bin.

Mêrik hebekî fikirî, dû re li wî nihêrî û got:

- Hela tu were şîva xwe bixwe, ez ê sibehê herim sûkê, ji te re bisiklêtekê bikirim.

Gava bavê wî wilo got, hebekî dilê wî xweş bû. Ew rabû ser xwe, çû destên xwe şuştin, hat li ser sifrê rûniş û xwarina xwe xwar.

Di ser şîvê de bavê wî jê pirsî:

- Te got ew bisiklêt li cem kê hene?

- Li cem Forsonê hene. (Yekî din jî hebû, lê navê wî nedihate bîrê.

Piştî ku piçekî fikirî û ew navê din jî anî bîra xwe, domand) Yekî din jî heye, navê wî Mûsa ye. Dibe ku li ba Mûsa erzantir be.

62

Forsonê û Mûsa her yekî dikaneke wan ya bisiklêtan hebû. Lê wan bêtir bisiklêtên xwe didane bi kirê. Pênc deqîqe bi lîrayekê bû. Remo tew lê siwar nebûya, heftê du caran lê siwar dibû. Mesrefa ku bavê wî ji bo dibisanê didayê, wî nîvê pir dida bisiklêtan.

Bavê wî piştî ku ji xwarinê vekşiya, got:

- Ma tu cihê dikanên wan dizanî?

Remo cihê herdu dikanan jê re got. Dû re bi delalî ji bavê xwe re got:

- Ger tu bixwazî, ez ê sibehê destûra xwe ji mamoste bixwazim û ez ê jî bi te re bêm.

- Na, lawê min, tu ji dersa xwe nemîne. Ez ê sibehê herim dikanan û ji lawê xwe re bisiklêteke spehî bikirim.

Remo kirî ji kêfan bifiriya. Ew ji cihê xwe rabû û çû rûyê bavê xwe maçî kir. Wê êvarê heya bi dereng wî xwe bi diya xwe û bavê xwe şelafî kir, pirtûk û defterên xwe nîşanî wan dan û dersa xwe ji wan re xwend. Dû re bi çîrokeke bavê xwe di xew re çû.

Remo bisiklêt di xewnê de didît. Bisiklêta wî ne weke tu bisiklêtan bû. Gava ew lê siwar dibû û diajot, tekerê bisiklêtê ji erdê radibûn û difiriya. Ew di ser malan re, di ser çîyan re, di ser dar û daristanan re difiriya. Dû re wî lawê axê di xew de didît. Lawê axê di gel du lawikên din li wî dixistin û bisiklêta wî jê distandin. Ew jî digiriya, bi dû lawê axê de direviya û digot:

- Ev ne bisiklêta te yeee. . . Ev bisiklêta min eee. . . Bisiklêta min nebeee!. . . Bavê min ji min re kiriye. . . Bisiklêta min nebeee!. . .

Lê fikir û nedikir, lawê axê bisiklêta wî nedidayê. Dû re lawê axê lê vedigeriya û heya ku jê dihat lê dixist. Dawî dawî, Remo jî direviya malê, kêreke mezin ji mal dianî û lawê axê dida ber kêran.

Di wê heyecanê de, diya wî hêdî lihêfa wî ji ser wî hilanî û bangî wî kir:

- Remo, Remo! De rabe lawê min, tu ê ji dersa xwe bimînî ha! De rabe bavê diya xwe, dereng e!. . .

Remo veciniqî û hişyar bû. Weke ku mirov ew di avê dakiribe,

63

laşê wî ji xwêdanê şil bûbû. Wî bi wê heyecanê xwe avête hemêza

diya xwe û giriya.

Diya wî bi ecêbmayî jê pirsî:

Çi ye lawê min, çi bû ye? Ji bo çi tu digirî?

Remo bi îskînî got:

Yadê, lawê axê, lawê axê. . .

Diya wî peyva wî birî:

Çi bû ye Remo? Ma te xêr e, bavê diya xwe? Lawên axan maxan li vir tune ne. Em li bajêr in, bavo!

Lawê axê, yadê, lawê axê gundê me. . . Min xewn dît ku min ew dikuşt...

Hişş... lawê min, qala kuştin muştinê meke. Rabe taştiya xwe bixwe, ancax tu bigihîje. An na tu ê ji dibistanê bimînî ha!

Remo nedixwest tu caran ji dibistanê bimîne. Ji xwe ew tu caran jî jê nemabû. Zarokên ku ji dibistanê diman ji dersên xwe jî diman.

Lê Remo zaneyê dibistanê bû. Dersa ku wî herî pir jê hez dikir jî dersa îro bû. Dersa wan matemetîk bû. Remo gelekî ji matemetîkê hez dikir. Wî dikarîbû ji yekê û heya bi milyonan û deh milyonan bihejmarta û binivîsanda. Ji bilî wê jî, hemû hesabê bavê xwe wî çêdikir.

Carna wî ji bavê xwe dipirsî:

Heft caran heyşt çiqas dike, bavo?

Bavê wî difikirî û bi tiliyan dihejmart. Hingî Remo pê dikeniya.

Bavê wî jî digot:

Ma ez ê ji ku weke te zane bim, lawê min? Ez li eskeriyê hînî xwendin û nivîsandinê bûme. Ji xwe qet hişê min nagihîje van mîratên hesaban. Li eskeriyê jî qet hişê min nedigihîştê.

Piştî ku Remo taştiya xwe xwar, ji diya xwe pirsî:

Yadê, ma kanî bavê min?

Yadê bi qurban, ew çû ye kar.

Mawî qala bisiklêtê kir?

Çawa? Wî got, piştî kar ez ê herim ji Remo re li bisiklêtekê binihêrim, ku têkeve serê min ez ê jê re bikirim.

64

Remo diya xwe hemêz kir:

Tu bi rastî dibêjî yadê? Ma wî got, ku ew ê ji min re bisiklêtekê bikire?

Diya wî jî ew maçî kir û got:

- Erê yadê bi qurban, bi serê te wî got ku ew ê ji te re bisiklêtekê bikire.

Remo rahişt çentê xwe û bi lotikan ber bi dibistanê ve baz da.

Êvarî, gava vegeriya malê, dît ku bisiklêteke sor û nû li ber derî ye.

Wî pêşî bi çavên xwe bawer nekir; dû re baz da û lê siwar bû. Ji kêfan kirî bifiriya. Hem dikeniya, hem jî hêsir ji çavên wî dihatin. Lê hêsirên ku ji çavên wî dihatin jî, dîsan ji kêfan bû.

65

BOYAXKERÊ SOLAN

Osman xwe kelogirî kir û ji diya xwe re got:

Yadê, ji min re sindoqekê bikire, ez ê ji xwe re boyaxê bikim û peran bidime hev.

Diya wî lê vegerand.

Lawê min tu nikarî, tu ê çawan boyaxê bikî?

Vê carê Osman xwe hebekî delalî kir û got:

Wele ez dikarim bikim. Çima kincên lawê cîranê me xweşik in û solên wî nû ne û yên min kevin in? Ez ê ji xwe re boyaxê bikim û ji xwe re pê kincan bikirim.

Diya wî stûyê xwe xwar kir û bi keser got:

Lawê min bavê te çûye kar, bi xêr ew ê îdê were malê. Hingî ez

ê ji lawê xwe re qatek kinc û cotek solên xweşik bikirim.

Lê Osman dîsan qebûl nekir, herdu lingên xwe li erdê xistin û bi kelogirî got:

Na, na! Wele tu ji min re kincan nakirî! Tu ê wekî par bibêje ku " em ê bi van peran kiriya xênî bidin û ji xwe re pê genim bikinn

.

Diya wî ber bi wî çû, ew maçî kir û got:

Bi soz ez ê îsal ji lawê xwe re kincan bikirim.

Lê Osman jê bawer nekir. Ji ber ku wan her sal digotin " em ê ji te re kincan bikin" lê nedikirîn. Îda Remezanê, gava Osman û zarokên hevalên xwe li malan, li şeker geriyabûn, hevaleyê wî nehiştibû ew bi wan re bigere, dehfeq dabûyê û gotibû:

Bi me re negere! Kincên te pînekirî, solên te qetiyayî ne, û lê xistibû.

Osman jî hingî geriyabû, bazdabû malê û bi ser diya xwe de qîriyabû.

66

Gava ew tişt dihatin bîra Osman, Osman hê bêtir bi ser diya xwe de digiriya.

Diya wî ji ber wî nekir der, rabû ser xwe û ber bi kulînê ve meşiya.

Wê ji kulînê destê xwe xiste hava lihêfekê, perên xwe yên ku di nava kevnikekî de girêdayî bû, derxist û du pelên deh lîrayî jê derxistin.

Paşê wê ew destmala xwe girê da û dîsan xiste nava lihêfê.

Wê ew bîst lîrayên ku derxistibû dirêjî Osman kir û got:

- Ha ji te re lawê min, here ji xwe re sindoqekê bikire.

Osman ji kêfan kirî bifiriya. Hema wî bi herdu destan êrîşî wan peran kir. Lê gava ew bi tenê biçûya ser xerê, dibû ku Apo Ehmed jê re sindoq çênekira. Ji ber ku ew hîn zarok bû. Dibû ku Apo Ehmed baweriya xwe bi wî neanîba.

îcar ew li ber diya xwe geriya û bi stûxwarî jê re got:

- Yadê! Ma çî dibe lê, bi min re were ser xerêt, da ew zû ji min re sindoqekê çêbike.

Diya wî li wî nihêrî, dilê wê pê şewitî, nexwest ku kêfa wî bişikîne, got:

- Xwe ragire lawê min, ez hevîr bikim, ez ê bi lawê xwe re werim ser xerêt.

Osman lê vegerand:

- De yadê qurban, zûka hevîr bike.

Diya wî çû teştê hevîr derxist, bir da ber kîsê êrd, çend mist ard berda binê teştê û rûnişt û hevîrê xwe kir.

Tebatî nedikete Osman, wî her li dora diya xwe dida lotikan.

Geh av bera ber destê wê dida, geh jî hevîrê ku ji teştê dipekiya dida hev û dixiste teştê.

Diya wî hevîrê xwe qedand, secadeke kevin avête ser û teştê xwe danî quncikê.

Osman hîn jî vir de û wir de baz dida. Hema digot:

- Zû yadê!

Diya wî jî ew qet nedişikand. Her ku wî digot "zû yadê" , diya wî jîdigot:

67

- Erê yadê bi qurban, em ê herin.

Piştî ku diya wî hevîrê xwe danî quncikê, dawa xwe dawşand, destên xwe şuştin û ji Osman re got:

- De heydê lawê min, em herin, berî ku bibe êvar.

Osman destê xwe avête kirasê diya xwe û derketin. Mala wan hebekî li derveyî bajêr bû. Çemekî mezin di ber mala wan re derbas dibû. Gava dibû zivistan, carna ew çem radibû, ava wî pir dibû, dibû

weke lehiyekê. Lê niha havîn bû, ava di çê de bi delkan diçû.
Roj dijar bû. Ji germa leylan rabûbû. Heke mirov satileke ava cemidî
daniya ber tavê, ew ê di hundirê pênc deqîqan de germ bibûya.
Di wê germê de Osman û diya xwe ber bi bajêr ve dilezandin.
Osman hîn jî dawa diya xwe bernedabû. Te digot qey wê diya wî ji
destên wî baz bide. Destekî wî bi kirasê diya wî ve bû û destê din jî
li ba dikir. Gava wan çem xelas kirin, Osman xwe avête pêşiya wê û
got:

- Yadê, ez ê bêjim:

Boyax, boyax!...

Apo, boyax!...

Xalo, boyax! . . .

Ez solan dibiriqînim! . . .

Ger hûn xwe tê de nebînin,

Çerxîkî jî nedine min! . . .

Ji bo ku ez gelek pere bidime hev û ji te re jî huburiyekê bikirim.

Kêfa diya wî ji wan peyvên wî re hat, daqûl bû, ew maçî kir û

got:

- Eferim lawê min. Lawê min jêhatî ye. Lê tu û zarokên xelkê li
hevnexin haa!...

Osman got:

- Na, na.

Wan riya xwe nêvî kiribûn, bi qasî deh deqîqan mabû ku ew bi-

68

gihîştina ser xerêt. Lê roj hîn germtir bûbû, mirov digot qey agir bi
erdê ketiye. Osman û diya xwe di xwêdanê de mabûn, lê qet ne xema
Osman bû, hê jî destê wî bi kirasê diya wî ve bû û xwe li ba dikir.
Edî ew ketin nava bajêr, wan xwe dane kêlekeke dikanan û xurt

meşîyan. Dikan bi rêz bûn. Li ber hin dikanan sindoqên bacan, îsot, firingî û pîvazên şîn hebûn. Li ber hin dikanan jî tayên rengo mengo bi dar de kirî bûn. Osman û diya xwe her dimeşîyan. Berî ku ew bigihîjin ser xerêt bi sê-çar dikanan, Osman got:

- Yadê, yadê, ka binêre!

Wî hin zarokên boyaxker dîtibû. Diya wî sekinî û li wan zarokan nihêrî. Çar zarok bûn. Herçaran jî sindoqên xwe danîbûn ber xwe û rûniştibûn. Lê yekî ji wan çiqasî xweş dikir. Gava wî firça xwe li sindoqê dbcist, mirov digot qey ew li tembilkê dixê. Wisan xweş lê dixist. Hema Osman li firça wî û li sindoqa wî dinihêrî. Ger bi a Osman bûya, ew ê li wir pir bimana, lê diya wî destê wî kişand û got:

Zû lawê min, dereng e, ancax em bigihîjin.

Osman xwe piçekî delalî kir:

Yadê, ez ê jî bikaribim wisa bikim?

Diya wî bi mana "erê" serê xwe ber bi jêr ve hejand û got:

- Erê lawê min, tu ê jî hîn bibî.

Ew meşîyan, ketin nava dikanên xeratan. Wan çavên xwe li dikana Hoste Ehmed gerandin. Hoste Ehmed destbirakê bavê Osman bû. Demekê wî û bavê Osman bi hev re qaçaxî dikirin. Ew pir caran hatibûn girtin, pir caran jî ji mirinê filitî bûn. Carekê jî gava ew bi şev li tixûb dixin, bi lingê Hoste Ehmed de bombe diteqe. Ji wê rojê û bi vir de ew dev ji qaçaxê berdidin. Bavê Osman her havîn diçû bajarê mezin kar dikir, Hoste Ehmed jî bi wan pereyên ku ji qaçaxê dabûne hev, ji xwe re pê dikaneke xeratiyê vekiribû û kar dikir. Ew gihîştin ber dikana Hoste Ehmed û derbasî hundur bûn.

69

Hoste Ehmed tenê dergûş çêdikir. Bi qasî deh dergûşan li hundur

hebûn û yek jî di destên wî de bû, çêdikir. Hoste Ehmed serê xwe hilda banî, por û bijankên wî ji toza textan spî bûbûn.

Xatûnê rojbcêrbûn dayê.

Hoste Ehmed,

- Wey tu ser, ser û çavên min re hatiyî, Xatûn, got. Kerem bike, derbas be.

Xatûnê derbas bû, xwe da ser textikekî û rûnişt.

Hoste Ehmed şelwerê xwe dawşand û pirsî:

- Eê. . . Xatûn, de ka bêje, hûn çawn in? Hûn ji birakê min Misto naman digirin an na?

Xatûnê piçekî din jî cihê xwe xweş kir:

- Erê Wele kekê Ehmed, berî çendeyekî nameke wî hat. Wî gotibû ez ê berî îda qurbanê bi pênc rojan werim.

Hoste Ehmed:

Nabêje karê wî çawa ye?

Xatûnê:

Xwedê zane di avahiyekê de kar dike.

Vê carê Osman, ji bêhna toza textan kuxuya. Bi kuxîna wî re,

Hoste Ehmed berê xwe pê ve kir û pirsî:

Êê Osmankê min, tu çawa yî?

Osman weke ku fedî kir, bi dengêkî nizim bersiv da:

- Ez baş im, apo.

Xatûn, hûn ê kengî Osmên bişînin mektebê?

- Bi xêr sala bê, kekê Ehmed. Mesrefa mektebê giran e, lê Osman dbcwaze bixwîne.

Hoste Ehmed, bi dengêkî gur got:

Na, na ! Lêwik bişînin, mekteb baş e, Xatûn ! Bila ji xwe re bixwîne, bibe tiştêk. . .

Kêfa Osman wê bîskê ji sohbetê re nedihat. Hema wî dixwest deqîqekê berî deqîqekê sindoqa wî çêbibe, ji xwe re boyaxê bike û pê kincan bikire. îcar xwest ku bala diya xwe bikişîne ser xwe, ziq li ça-

70

vên wê mêze kir.

Diya wî lê hayî bû. Wê fêhm kir ku tebatî nakeviyê. Ji ber vê yekê zû ji Hoste Ehmed re got:

- Kekê Ehmed, riceke min ji te heye.

Hoste Ehmed wa bi şaşmayî li çavên wê nihêrî:

- Kerem bike, Xatûn.

- Osman dixwaze ji xwe re boyaxê bike.

-Êêê?...

- Lê sindoqa wî tune ye. Em hatine ba te, ji bo ku tu jê re sindoqekê çêbikî. Hoste Ehmed keniya:

- Rice gişt ev bû, Xatûn?

- Erê Wele, kekê Ehmed.

Di wê navberê de, Osman ew bîst lîrayên ku pê re bû, dirêjî Hoste Ehmed kir.

Hoste Ehmed destê wî guvaşt,

- Na lawê min, got, ma ez ê çawan peran ji te bistînim? Tu ji xwe re bi van peran firçe û boyaxê bikire. Lê piştî du rojên din were sindoqa xwe bibe.

Piştî ku Hoste Ehmed weha got, Xatûnê nizanîbû ku bi çi awayî spasên xwe jê re pêşkeş bikira, lê piçekî fikirî û bi stûxwarî got:

- Xwedê ji te razî be, Xwedê kêmasiyê nede te.

- Tu çi dibêjî Xatûn? Min û bavê Osmên tam deh salan bi hev re karkiriye.

Xatûnê dîsan got:

- Xwedê kêmasiyê nede te !

Paşê ew rabûn ser xwe ku herin. Hoste Ehmed jî rabû ser xwe û bi wan re derket heta bi devê dêrî.

Osman û diya xwe ji Hoste Ehmed xatir xwestin û berî dane malê.

Piştî ku du roj di navberê de derbas bûn, Osman dîsan çû ba Hoste Ehmed. Hoste Ehmed sindoqa wî çêkiribû, jê re qayîşek jî lê xistibû. Osman qayîşa sindoqa xwe avêt stûyê xwe, bi lez ji dikanê derket û ber bi dikana boyaxê ve çû. Wî ji xwe re firçe û boyax 7i

kirî, çû li ba zarokên boyaxker rûnişt û bang kir:

Boyax, boyax!...

Apo, boyax!...

Xalo, boyax! . .

Ez solan dibiriqînim!

Ger hûn xwe tê de nebînin,

Çerxîkî jî nedine min!

Hema zilamekî dirêj, bi navmil, sola xwe danî ser sindoqa wî û got:

- Zû birazî, qondera min boyax bike, berî ku makîne here.

Osman firçe û boyaxa xwe derxist û got:

- Baş e, apo, ez ê a niha, di deqîqekê de boyax bikim.

Piştî ku Osman qondera wî boyax kir, mêrik du lîra avête ser sindoqa wî û çû.

Osman ew du lîra avêtin çavîka sindoqê û got:

- Ev sifteh e.

Wî heta êvarî panzdeh lîra kar kir. Hîn jî boyaxa wî bi têra du rojan mabû. Berî ku ew here malê, ew çû dikanê, qevdek pîvazên hêşin kirî û dû re berê xwe da malê û lezand.

Gava ew gihîşte malê, dît ku diya wî li ber kuçik e, agirê bin beroşê tev dide.

Osman berî ku têkeve hewşê bang diya xwe kir:

- Yadê, yadê !

Diya wî rabû ser xwe û bi kêfgot:

- Tu hatî lawê min?

Ji kêfa devê Osman nedikete hev, wî jî bi ken got:

- Erê yadê, binêr. . . Va min pîvaz jî kiriye û hîn çardeh wereqe jî bi min re hene.

Diya wî ber bi wî çû, ew maçî kir û got:

- Eferim lawê min ! Wê lawê min ji xwe re pê kincan bikire.

72

Paşê wê qevda pîvazan ji destên wî girt û çû hundur.

Kincên Osman, dest, ser û çavên wî di boyaxê de mabûn. Diya wî kincên wî jê kirin û bi ava cemidî serê wî şuşt. Paşê wê pantorek û gomlekekî milkurt lê kir.

Êdî tarî dakete erdê, bû dema şîvan. Diya Osman çû şîva xwe ji ser êgir daxist, xiste firaxekê û anî danî ser sifrê. Paşê wê bang Osman û birayê Osman yê biçûk kir û li dor sifrê rûniştin û xwarina xwe xwarin.

Osman di ser şîvê de her qala xwe û boyaxa xwe kir. Tew bi ya wî bûya, wî ê birayê xwe yê biçûk jî bi xwe re bibira, lê diya wî nehişt ûgot:

Na lawê min, hê Hesenko biçûçik e. Kengî ew jî weke te mezin bibe, hingî bila apê wî Ehmed jê re sindoqekê çêbike û ew jî were bi lawê min re boyaxê bike.

Oman şîreta diya xwe qebûl kir û lê vegerand:

Yadê, gava kekê min jî bi min re were, hingî em ê pir peran bidine

hev û em ê ji bo mektebê ji xwe re pê qelem û defteran jî bikin.

Diya wî dîsan keserek kişand:

Erê lawê min, hûn ê ji xwe re pê her tiştî bikin.

Piştî şîvê bi demeke kurt, wê rabû nivînê wan li erdê raxist û bang wan kir:

De werin lawên min, werin razên. Osman, rabe razê lawê min, ji bo tu sibehê zû rabî ser xwe.

Osman ji cihê xwe hol bû û çû kete nava nivînê xwe.

Ew bi rohilat re rabû ser xwe, ser çavê xwe şuşt, xurîniya xwe kir, rahişt sindoqa xwe, avête milê xwe, berê xwe da sûkê û çû li cihê xwe yê berê rûnişt. Wî heta bi nîvro bi deh lîran boyax kir. Paşê çû ji xwe re perçak nanê firnê û çend lib zeytûn kirî û hat li ber sindoqa xwe rûnişt û xwar. Wê rojê sûk gelekî qerebalix bû. Nemaze ji gundan pir mirov hatibûn; yê mast anîbûn ji bo firotinê, yê hêk û yê barên êzingan. . . Ji bilî wan jî ew roj, roja çûyina eskeriyê bû.

73

Sûk tijî xort, kal, pîr û zarok bûbû.

Wê rojê Osman tam bi sih lîran boyax kir. Berî ku tarî dakeve erdê, ew rabû ser xwe, sindoqa xwe avête milê xwe û berê xwe da malê.

Gava ew gihîşt malê, hîn roj bi qamekê bilind bû. Diya wî şaş ma, ji wê webû beleni hatine serê wî. Lê gava ew gihîşte cem, Osman keniya, diya wî xwe negirt û pirsî:

Xêr e, lawê min? Çima tu weha zû hatî?

Osman destê xwe avête bêrika xwe, sih lîra nîşanê wê da û got:

A ez ji bo van zû hatim dayê ! Ma qey ne bes e?

Diya wî ji nû ve ruh pê ve hat. Wê sindoqa wî ji milê wî kir û bi hev re meşyan malê. Paşê şîva wî li ber wî danî, li ba wî rûnişt û bi stûxwarî jê re got:

Osmankê min. . .

Osman serê xwe rakir, pariyê di devê xwe de cût û got:

Çiye yadê?

Lawê min, tu ê bikanibe sibehê şûşa gazê bi xwe re bibe û ji me re hinek gaz bikire?

Osman dîsan kevçiyek li xwarinê xist û got:

Bila yadê, bila. . .

Ew şev di ser wan re derbas bû. Osman sibehê zû rabû ser xwe, weke her car ser çavê xwe şuşt, xurîniya xwe kir, rahişt sindoqa xwe, avêt milê xwe û çû li cihê xwe ê berê rûnişt.

Wî heta nîvro kar kir. Paşê nihêrî ku cîpek sekinî û çend zilaman xwe jê avêtin. Gava wan zilaman xwe avêtin, zarokên li ba Osman gişa bazdan. Lê, Osman şaş ma. Wî nizanîbû çî bûye, an ji bo çî hevalên li ba wî hemû reviyar. Hîn ew wisa difikirî, yekî ji wan peyan bi milê wî girt û şîmaqek lêxist. Pasê pehînek li sindoqa wî xist û got:

Hey bêjî lawê bêjiyan! Ev çend car in em ji we re dibêjin li vir boyaxê nekin?

Hingî Osman têgihîşt ku ew çawîşên belediyê ne. Hema wî rahişt sindoqa xwe û ji destên wî baz da. Çawîş da dû wî. Di wê navberê

74

de, texsiyek ji jor ve xurt dihat. Texsiya ku xurt dihat, ji nişkê ve li nava guhcn Osmên kct. Tenê dengê ji Osmên derket, dengê bi qêrîn. Esnaf, nanpêj û barkêşên wê dorê hemûyan baz dan, hatin ser Osman. Nihêrîn ku sindoq, boyax, firçe û şûşa wî ya gazê her yek bi derekê de belav bûye, Osman di nava tekerên texsiyê de bûye nanik.

75

CIWANGEYÊTEMO

Ne çengek don ne jî qutikek êzing di mala wan de nemabû. Ev sê rojên wan bûn ku ew her şev di tariyê de bûn û ji serma dirikrikîn. Hema ku tarî dikete erdê, ew ji bo ku necemidin diketin nava nivînên xwe û wisan di tariyê de, bêî ku ew rûyê hevdu bibînin, ew bi hev re dipeyvîn. Ew wisa heya dereng bi hev re dipeyvîn, henek dikirin, dikenyan û carna jî pevdîçûn, lê wan rûyê hevdu nedidîtin. Şeva çaran, hîn berî ku tarî dakeve erdê, mêrik berê xwe bi jina xwe vekir û got:

Wele ku em vî cangî nefroşin rewşa me xerab e, em ê perîşan bibin.

Jinikê hebekî bi sertî bersiv da:

Rewşa xerab ji mêrê xerab dertê! Kuro ma tu jî peya yî, tu jî wekî Soro yî! Ha ha tu dibînî ku jina Soro nikane di bin zêran de bimeşe, tu komên êzingên li ber deriyê wî dibînî ! Ma ka çiyê te ji yê wî kême? Weleh bi qamê be tu du caran li wî yî. Bi simbêla be simbêlê te ji yê wî mezintir e. Bi peyvê be zimanê te ji yê wî dirêjtir e. Kuro aqilê te tune ye, aqil. . . Ger dilê te bi te naşewite, bila bi me bişewite. Ev çar rojên me ne, ku em di vê tariyê de ne û ji serman dirikrikin, ma qumara te ji me kême?

Mêrik wê bîskê tişteke negot, ji wê peyva xwe ya ku kiribû, poşman bû. Mîna yekî ku bi sûcê xwe bizanibe, bêdeng ma. Piştî ku ji sifrê vekîşiya, got:

Weleh, bi serê Temo ez hew bi qumarê dileyizim. Ku ev zivistana han di ser me re derbas bibe, bi soz ez ê îcar weke mirovan li kar û îşê xwe binêrim û dev ji qumar mumarê berdim.

Jinikê destê xwe li ba kir, serê xwe vir de û wir de hejand û got:

Lo Weleh ez ji te bawer nakim. Ma ev cara te ya çendan e, ku

tu sozan didî û dibêjî, ez hew bi qumarê dileyizim. Te par jî soz da, ku tu ê hew bi qumarê bileyizî. Te hemû perên karê me dan hev û te got: "Ez ê herim bajêr genim bikirim". Piştî wê bi du rojan tu destvala bi ser min de vegehiya.

Mêrik cigareyek pêça û vexist. Gava wî cigara xwe vexist, bi şewqa heste hundur rohnê bû. Hingî çavên wî li Temo ketin. Temo lêva xwe daliqandibû û dikire îskînî. Mêrik bi ser de qîriya:

- Çi ye kuro? Ma te xêr e? Dêrdê te çi ye? . . .

Ji berdêla Temo diya wî bersiv da:

- Ma qey tu bi dêrdê wî nizanî? Gelo ji ciwangeyê wî pê ve çiyê wî heye ? Te jî çavê xwe berdaye firotina ciwange.

Gava jinikê wilo got, mîna ku hêzek ji Temo re çêbû, ew bi dengekî bilind giriya.

- Weleh ez nahêlim tu cangê min bifiroşî. . .

Bavê wî bi nermî bang wî kir, destê xwe li mîndera ber xwe xist û got:

- Hela tu were li ba bavê xwe rûnê, hela were. . .

Temo dîsan bi kelogirî got:

- Weleh ez nahêlim tu cangê min bifiroşî!

- Erê lawê min, hela tu were.

Temo kire îskînî, ji cihê xwe rabû û çû nik bavê xwe, li ser mînderê rûnişt. Bavê wî destê xwe danî ser serê wî û tiliyên xwe di nava porê wî de bir û anîn. Dû re wî ew ber bi xwe ve kişand, destê xwe avête paş stûyê wî û got.

- Lawê min, tu rewşa me dibînî, tu dibînî bê em di çi rewşê de ne. Em niha vî ciwangeyî bifiroşin, bi soz ez ê havînê ji lawê xwe re dîkekî bikirim, dîkekî şer. . .

Temo îcar bi delalî giriya. Bavê wî pê re nexeyidî û ew neşikand; dîsan ji bo firotina ciwange li ber wî geriya.

Temo di wê bîskê de hebekî nerm bû, ew ne giriya, ne jî pozê xwe daliqand.

Diya wî di wê navberê de donê ku ji mala cîra-nê xwe deyn kiri-
77

bû, berda lampê û lampe vexist. Bi vêketina lampê re hundur rohnî bû.

Temo xwe hîn bêtir ber bi bavê xwe ve dikişand. Hêdî hêdî ber bi wî çû û dawî di hemêza wî de rû-nişt. Piştî ku jinekê lampe bi dar de kir, rahişt secadekê, avête nava milên xwe û ew jî li kêleka wan rûnişt. Dû re berê xwe bi Temo ve kir û bi devkenî jê re got:

- Tu û bavê xwe çiqasî ji hev hez dikin.

Mêrik destên xwe li nava Temo gerandin, ew hebekî hejand û got:

- Lawê min şêr e, şêr. . . Wê bavê wî jê re havînê dîkekî bikire.

Jinik wextî li hemberî peyva wî derketa û bigota "tu dîsan lêwik dbcapînî" lê negot; wê nexwest ku kêfa wan li wan bişikîne û nexweşiyê têxe nava malê.

Temo îcar destên xwe l'i destên bavê xwe gerandin û ji diya xwe re got:

- Yadê, ma tu dizanî ku wê bavê min ji min re dîkekî şer bikire?

- Erê yadê bi qurban, ez dizanim.

Mêrik îcar hebekî lawik da aliyekî, xwe dirêjî qutiya xwe kir û cigareke qalind pêça. Dû re wî berê xwe bi jina xwe ve kir û bi dilşahî got:

- Hela tu bi xêra bavê xwe ji me re çayekê çêbike.

Jinikê dil kir ku dîsan tişteki li dijî wî bibêje, lê negot. Ew rabû

ser xwe, çû çaydan tijî av kir û bir danî ser êgir.

Bi çayêvexwarinê re mêrik çîrokek jî got. Piştî çîrokê wî bîskê qala eskeriya xwe û şerê Yunanê kir. Dû re jinikê jî çîrokek got. Lê çîroka jinikê Temo bi zorê pê da gotin. Temo li ser wê çîrokê ruh û can dida, wî pir jê hez dikir. Ger diya wî ji wî re bigota, wî dikarîbû bi saetan li wê çîrokê guhdarî bikira. Ew tu caran jê aciz nedibû. Temo bi çîroka diya xwe re di xew re çû. Edî şev baş dereng bûbû, jin û mêr jî baş westiyabûn û li ser hev dibawişkîn. Ji bo ku ew don zêde xerc nekin, wan jî rabûn nivînê xwe li erdê raxistin, pifî lampa xwe kirin û razan.

78

Mêrik sibehê zû, berî rohilat rabû ser xwe. Bi dengê teqereqa wî, jina wî şiyar bû; herdu çavên xwe firkandin, piştî ku bawişkî, got:

- Ma qey tu dikî bi rastî jî ciwangeyê lêwik bifiroşî kuro?

- Ma ka tu riyeke din heye?

- Weleh lawik wê xwe ji bo ciwangeyê xwe bikuje. Tu bi a min dikî dev ji firotina ciwange berde. Em herin xwe biavêjin camêrna, dibe ku em bikaribin tişteki ji wan deyn bikin. Tew nebû, ez ê herim xwe biavêjim birayê xwe, tişteki ji wî deyn bikim.

- Keçê min bi zorê bi lêwik daye qebûl kirin. Ma em ê ji ku herin xwe biavêjin xelkê û peran ji wan deyn bikin. Tew belengazê birayê te wê ji me re peran ji ku bîne? Tu dibînî ku ew bi xwe di bin deynan de ye.

Bi dengên peyv û munaqeseya wan Temo hişyar bû, xwe du caran vir de û wir de qulupand, rabû û li ser xwe rûnişt. Dû re wî dusê caran xwe vezeland û bawişkî. Gava dê û bav dîtin ku Temo rabû, wan dev ji munaqesaya xwe berdan û peyva xwe guhertin ser tişteki din. Dû re mêrik berê xwe bi Temo vekir û bi devkenî jê re

got:

- Temo, de rabe lawê min, berî ku bibe dereng.

Temo wê şevê baş raneketibû. Wî heya bi sibehê xewnên tewlo mewlo dîtibûn. Ji ber ku ew baş raneketibû, ew pir bêxew û westiyayî dixuya. Ew her dibawîşkî û devê wî digihîşt guhên wî.

Bavê wî dîsan got:

- De rabe Temo! Rabe bavê min, dereng e!

Temo ji nava nivînan rabû ser xwe û rast çû daşirê. Piştî ku ji daşirê vegeriya û dest û ser çavê xwe şuşt, hema zû zû kincên xwe li xwe kir. Dû re ew bi dê û bavê xwe re çû êxur, da ku ciwange bigirin û bibine bajêr. Gava Temo ber bi ciwange çû, ciwange serê xwe ber bi wî ve kir û destê wî alast. Wê bîskê jin û mêr li çavên hevdu nihêrîn. Wex-tî jinikê dîsan bigota "dev ji firotina ciwange berde" lê negot. Hersiya alîkariya hevdu kirin û werîs xistin serê chvange. Gava wan ciwange derxistin der, mêrik li paş xwe zîvirî û ji Temo

79

re got:

- Temo, lawê min, tu bi a bavê xwe bikî, tu li mal bimîne. Dinya sar e, rê bi herî û çirav e. (Berê xwe bi asman ve kir) Binêre, li ku be wextî baran bibare; em ê perîşan bibin lawê min. Tu bi a min dikî, tu neyê.

Diya wî îî got:

- Tu neçe kuro, tu ê di rê de ji serman biqefilî.

Lê Temo xistibû serê xwe ku here. Yek jî, bavê wî do êvarî jê re soz dabû, ku ew ê wî jî bi xwe re bibe.

Temo lêva xwe daliqand:

- Weleh ez ê bêm. Çima te do êvarî got ku tu ê min bi xwe re bibî bajêr?

- De baş e, wê çaxê here vezelekî din jî li xwe bike.

Temo bi kêf baz da hundur, buxçuka li ser sindoqê daxist, bi lez û bez vezelekî din jî di ser vezelê xwe de li xwe kir, dû re çakêtê xwe li xwe kir û reviya derve.

Diya wî bi wan re derket heya ser rê. Gava wê ew bi rê kirin û vegeriya, got:

- Temo, lawê min, tu bi a min dikî tu nere.

Temo dîsan lêva xwe daliqand:

- Weleh ez ê herim.

Law û bav ketin rê û meşyan. Dinya her ku diçû nexweştir dibû.

Ewr weke merşeke reş li asman vir de û wir de diçerixî. Piştî ku ew ji gund bi dûr ketin, baranê dest pê kir. Lê çî baran. . . Mirov digot qey bi kûzan tê.

Temo carina neh-deh gavan li dû bavê xwe dima. Piştî ku ew hebekî din jî mesyan, êdî ciwangeyê wan hew meşiya. Mêrik werîs li nava xwe gerand û ew wilo kişand. Lê fikir nedikir ciwange xwe tevnedilivand, wî tenê bi înad serê xwe li ba fikir. Dû re mêrik baş werîs li destê xwe gerand û ji Temo re got:

- Temo, ciwange dehfbide lawê min, dehfbide!

Temo hema bi jîrî çû paş ciwange, herdu destên xwe dane hêtên

80

wî û ew dehf da. Ciwange îcar mîna hespa ku serî ji siwêr bistîne, xwe hol kir û çend zîtok avêtin Temo. Bi zîtokên ciwange, Temo li ser piştê, di nava heriyê de li erdê ket. Mêrik xwe şaş kir, bi lez reviya ser Temo û got:

- Temo, ma tu êşiya lawê min? Hela tu rabe ser xwe...

Temo di herî û çiravê de mabû. Gava ew rabû ser xwe çirav jê niqutî.

Hingî ew poşman bûbû ku ew bi bavê xwe re hatibû. Lê dê çî

bikira, ew ji gund pir bi dûr ketibûn.

Bavê wî kire niçeniç, serê xwe vir de wê de hejand, li rewşa wî nihêrî û got:

- Hûn bi a mirov nakin, lawo! Min ji te re got, neyê, dinya ne xweş e, baran e, şilî û şepelî ye...

Mêrik bi hêrs ho kir ciwange û werîsê wî kişand. Vê carê mîna ku ciwange tî be û mirov berê wî bide avê, zû meşiya. Temo dîsan da dû bavê xwe û ciwange û bi wan re xurt meşiya. Dû re wî lêva xwe daliqand û bi dengekî nîvgirî got:

- Ma ne te do êvarî ji min re got, ku tu ê min jî bi xwe re bibî bajêr?

- Erê lawê min, min ji te re got ku ez ê te bi xwe re bibim bajêr, ma min ji ku dizanîbû ku wê wilo şilî û şepelî be.

Ew li dor saet yekê piştî nîvro gihîştin bajêr û rast berê xwe dane mazatê. Li mazatê mirov nikanîbû ji însan û heywanan gava xwe biavêta. Wer ku baran barî bû, mazat di herî û çiravê de mabû. Temo û bavê xwe ciwange ajotin nava mazatê.

Her ku diçû, dinya bêtir dicemidî. Piştî demeke kurt, êdî ew herî û çirava mazatê hemû bû cemed û qeşa.

Temo werîsê ciwange li destê xwe gerandibû û ji serma dirikrikî.

Dû re ji bavê xwe pirsî:

- Ma ka wê kengî ciwange bê firotin, bavo?

Gava Temo ew peyvên han gotin, diranên wî ji serma li hev ketin.

Bavê wî bi pêçana cigara xwe biliya bû. Piştî ku wî cigara xwe pêça û vexist, got:

81

- Bi bêhna fireh lawê min, ew ê niha bê firotin.

Piştî mêrik ji ber firotina ciwange qewîn bû. Di hemû mazatê de ciwangeyekî mîna ciwangeyê wî qelew û bi goşt tune bû. Wî dizanîbû

dûr, an nêzîk dê ciwangeyê wî bête firotin û hem jî ew ê bi buhayekî baş bête firotin.

Hîn wilo, wî dît ku peyayekî qelew û serbitar bi Temo re dipeyive.

Temo bang wî kir:

- Bavo, were, xalo li ciwange dipirse.

Ji xwe bêje hema hema bavê Temo li ba wan bû, ew li mêrik zîvirî, destê xwe dayê û got:

- Kerem bike!

Mêrik destê bavê Temo berda, destmalek ji bêrîka xwe derxist, fiş kir û dîsan ew destmala xwe xiste bêrîka qapûtê xwe. Dû re du-sê caran li dû ciwange çû û hat, piştî ku destê xwe li pişt û hêtên ciwange xist, got:

- Tu ê vî ciwangeyî bi çiqasî bidî?

Bavê Temo milên xwe hejandin:

- Tu ê bi çiqasî bikirî? Mêrik dîsan destê xwe li pişt ciwange xist:

- Ev malê te ye, tu ê bi çiqasî bidî?

Bavê Temo baş bi buhayê mazatê nizanî bû. Gelo wî bigota bi çiqasî? Piştî ku ew hebekî fikirî û li Temo nihêrî, got:

- Ez ê bi du hezar û dused lîran bidime te.

Mêrik bi destê wî girt, hejand û got:

- Niha du hezarên rast çawan e?

Ji xwe armanca bavê Temo jî du hezar bû. Wî bi qestî got du hezar û dused. Gava wî di destpêkê de bigota, du hezar, mêrik dê kêmî du hezaran tê bidaya.

Bavê Temo ji Temo pirsî:

- Tu çi dibêjî lawê min? Em bi du hezaran bidine apê te?

- Bidiyê, Temo got û hû kir destê xwe.

Mêrik destê xwe xiste bêrîka pantorê xwe, deh lîrayê kaxezî der-

xist, dirêjê Temo kir û got:

- Ev jî ji biraziyê min re. Tu ji xwe re li bajêr pê tiştêkî bikire.

Gava Temo destê xwe dirêjê perên di destê mêrik de kir, li bavê xwe nihêrî.

Bavê wî:

- Rahijê lawê min, rahijê! Perê di destê apê xwe de bigire. . .

Temo ew deh lîrayê kaxezî girt û zû xiste bêrîka xwe. Ji roja ku wî bîr biribû û heya bi niha tu ca-ran deh lîra bi carekê ve neketibû destên wî.

Dû re mêrik cuzadanê xwe derxist, du hezar hejmartin destên bavê Temo, bi werîsê ciwange girt û got:

- Tu hezar xêrî ji perên xwe bibînî.

- Tu jî hezar xêrî ji ciwangeyê xwe bibînî.

Mêrik keniya û bi henek got:

- Ma ez ê çî xêrê jê bibînim, birako? Ew ê sibehê bête serjêkirin.

Dû re wî werîsê ciwangeyê xwe kişand, xatir ji wan xwest û çû.

Temo û bavê xwe jî ji nava mazatê derketin û ber bi sûkê ve meşyan.

Gava ew hebekî bi nav bajêr de çûn, bavê Temo ji Temo pirsî:

- Tu ne birçî yî lawê min?

Zikê Temo ji birçîna dikire qurequr,

- Belê ez birçî me, wî bi şermokî got.

Law û bav meşa xwe domandin. Serma zêdetir dibû. Ji xwe zivistanên

Erzeromê pir dijwar in. Zivistanan, ji bilî termên teyr û teban

û heywanên din, termên pir mirovên ku ji serma qefilî ne jî tête dîtin.

Piştî ku ew hebekî din jî meşyan, ew gihîştin ber xwaringeheke

biçûk. Berî ku ew têkevin hundurê xwaringehê, Temo lerizî, çongên

wî sist bûn û kete xwarê. Ji bavê wî webû, ku ew şemitî û kete

xwarê; wî herdu destên xwe xistin bin milên wî û xwest ku wî rake.
Lê Temo nikanîbû li ser lingên xwe rawestiya, ew dîsan lerizî û kete
xwarê. Bavê wî ew bi herdu destan hejand û bi heyecan got:

83

Temo, Temo! Ma çi bû lawê min? Çi bi te hat?

Tu deng ji Temo derneket, rengê wî bi carekê ve hate guhertin.

Rûyê wî û lêvên şîrkî bûn. Reşikên çavên wî du-sê caran winda
bûn, bi tenê spîk man. . .

Bavê wî dîsan ew hejand:

Temo! Temo! Ma çi bi te hat lawê min? Temo!. . .

Dû re ew têgihîşt ku Temo dike ji serman biqefile. Hema wî rahişte
Temo, xiste hemêza xwe û di wê sûkê de baz da. Lê wî nizanîbû,
ku ew bi ku de baz dide, an ew ê bi ku de here.

Gava ew gihîşte serê qorzîkekê, çavên wî li çayxaneyekê ket. Hema
ew zû kete hundur çayxanê û lawik bire ber sobê.

Hundurê çayxanê tijî peya bû. Ji dûyê cigaran mirov digot qey
hundur mij girtiye. Yên bi kaxezan dileyistin, yê bi dame û yê bi
domîne... Çend peyayên kal jî kursiyên xwe kişandibûn ber sobê,
rûniştibûn û cigarên xwe dikişandin.

Peyakî kal berê xwe bi bavê Temo ve kir û wa bi heyecan jê re
got:

Kuro ev lawik ji serma qefilî ye, lawo! Wî zêde nede ber sobê.

Dîsan reşikên çavên Temo winda bûn, tenê spîk man.

Kalo îcar bi hêrs got:

Kuro ev lawik mir, lawo!

Dû re wî rahişt Temo û ji bavê wî re got:

Bide dû min em herine mal, an na ew ê ev lawik bimire, ew ê ji
serma biqefile.

Ji ber ku Temo giran bû, kalo nikanîbû rahişta wî. Li ber deriyê çayxanê bavê Temo ew ji destên kalo girt û bi dû wî de lezand. Mala kalo li pişt çayxanê bû; tenê du dikan di navbera mala kalo û çayxanê de hebûn. Gava ew gihîştin mala kalo û ketin hundur, kalo bi dengê gur ji jina xwe re got:

Keçê zû qatek nivîn deyne.

Jinikê bi şasmayî doşekêk hirî danî û bi hev re kincên Temo jê kirin.

Piştî ku her yekî ji hêla xwe ve ew firmandin, pîrê ew li ser doşe-

84

kê dirêj kir, betaniyek avête ser û ji bavê Temo re got:

Bila dilê te ji ber lêwik safî be, birayê min. Tu tist bi lawikê te nayê. Bi xêr piştî nîv saeta din ew ê rabe ser xwe.

Paşê pîrê mînderin jî ji bo wan li erdê raxistin û ji wan re got:

Hûn kerem bikin rûnên, ez ê li lêwik binêrim.

Kalo û bavê Temo li ser mînderê rûniştin û cihên xwe xweş kirin.

Lê dilê bavê Temo bi tas û was bû. Ew ji ber Temo bi tirs bû. Wî di dilê xwe de digot: "Temo ji destên min çû". Lê ji aliyê din ve, ji ber mêvanperweriya malikê, ji wî re hêviyên pir mezin çêdibûn.

Kalo cigarek pêça û dirêjî bavê Temo kir. Bavê Temo cigare ji destê Kalo girt, lê vênexist. Piştî ku kalo qalûna xwe vêxist, ji bavê Temo pirsî:

Wilo xuya ye, hûn ji gundan in, ma xêr bû ku hûn vê sar û seqemê hatine bajêr?

Bavê Temo çîroka xwe ji serî heta binî ji kalo re got. Kalo serê xwe yê ku derdê wî parve dikir, hejand, du hulmên din jî li qalûna xwe xist û bang jina xwe kir:

Xecê, hela tu bi xêra bavê xwe ji me re çayekê bide ser êgir.

Jinikê bi devkenî got:

Min çayê zû de daye ser êgir, ew wextî bikele. . . Gava keliya, wê du qedeh danîn ser siniyekê û di gel çaydên anî danî ber wan. Dû re ew çû mitfaxê û ji bo lêwik jî şorbe danî ser êgir.

Heya ku şorbe nîvkelî bû, lêwik çavên xwe vekirin û mîna ku ji xeweke kûr hişyar bibe, bawîşkî û xwe vezeland.

Jinikê berê xwe bi bavê wî ve kir û bi ken got:

Min ji te re negot, ew ê di hundurê nîvsaetê de rabe ser xwe.

Binêre, hîn nîvsaeta wî jî neqediyaye.

Kalo henek kir û ji bavê Temo re got:

Bavo Wele heqê vê jina min ku ew doktor bûya, ew ji her tiştî fêhm dike.

Dû re wî li ser siniyê nihêrî, gava ji çayê û qedehan pê ve tişteki din nedît, dîsan henek kir û got:

85

- Lê çi fêde, porê wê spî bûye hîna jî nebûye kevanî. (Berê xwe bi aliyê jina xwe ve kir) hela ka pariyek nan û çend lib zeytûn jî ji me re bîne.

Lê jinikê ne tenê çend lib zeytûn, wê penîr, rîçal û du nanê firnê jî danîbû ser siniyeke din, da bîne ji wan re. Gava jinik tavi lê digel sifra xwarinê vegeriya, kalo şaş ma û jê pirsî:

Te çi zû anî, ma qey tu firiyayî?

Jinikê berê xwe bi bavê Temo vekir, keniya û got:

Bavo tu guh mede vî kalê rihspî û xurufî. Ew bi zimanê xwe nikane.

Kalo bi ken got:

- Keçê halê biraziyê min çawa bû?

Biraziyê te weke şêrekî ye, ew ê niha rabe. . .

Kêfa bavê Temo pir ji kalo û pîrê re hat. Herdu jî wilo henekkir

bûn ku mirov bi her peyvên wan dikeniya. Ew carna jê wilo bi hev

re dipeyvîn, ku mirov digot qey ew pevdîçin. Lê ya wan ne pevçûn bû, her henek bû. Bavê Temo dil kir ku ji wan bipirse bê tu zarokên wan hene an na, lê nepirsî, di dilê xwe de got: "Xwedê ji wan razî be, çiqas mirovin qenc in".

Dû re her sê li ser Temo hatine hev. Temo rabû û li ser doşekê rûnişt. Herdu hinarîkên wî û guhên wî sor bûbûn. Wî çend caran kire fişefiş û li bavê xwe nihêrî

Bavê wî jê pirsî:

- Tu çawa yî lawê min?

Temo bersiv neda û ziq li sifra xwarinê nihêrî. Jinikê tê derxist ku çavê Temo li xwarinê ye. Hema ew zû rabû ser xwe, çû şorba wî jê re xiste tacikeke kûr, anî danî ser siniyê û bang hersiyan kir.

Pêşî kalo, dû re Temo û bavê wî çûn li dor sifrê rûniştin. Temo wilo bîrbir bû ku heya kalo ji wan re negot: "Kerem bikin" wî destê xwe dirêjî xwarinê nekir.

Wê rojê kalo û pîrê ew bernedan. Ew heya derengê şevê peyvîn; wan qala gund û bajaran kirin, qala zemanê berê kirin, qala miro-

86
vantiyê kirin... Berî ku ew têkevin nava nivînan û rakevin, pîrê bi henekek cidî ji bavê Temo re got:

- Niha tu Temo li ba me nahêlî?

Ev peyva pîrê kete serê kalo. Kalo ji dil ji bavê Temo pirsî:

- Niha bi rastî tu Temo li ba me nahêlî? Em ê mîna lawê xwe lê binêrin û em ê wî ji bo xwendinê bişînin dibistanê jî. Ew peyvên kalo weke tişteki ku bi mêjiyê bavê Temo ve bizelîqe, cih girt. Ji xwe ew jî li tişteki wilo digeriya; bi çî awayî dibû bila bibûya, lê tenê bila Temo ji xwe re bixwenda û bibûya tişteki.

Bavê Temo ji Temo pirsî:

- Ma te bihîst lawê min? Tu dbcwazî li ba kalikê xwe û pîrka xwe bimînî?

Temo bi delalî got:

- Lêdiyamin?...

Kalo bi alîkariya destên xwe ji cihê xwe rabû, çû li ba Temo rûnişt, destê xwe di serê wî da û got:

Ji heftê carekê nebû, ji mehê carekê ez ê te bibime gund. Ma ne baş e Temokê min?

Temo tu bersiv neda, serê xwe xiste ber xwe û bi neynûkên xwe leyist.

Îcar pîrê got:

- Erê, erê, ew ê lawikê min Temo li ba me bimîne. Ne wilo, Temo.' Temo pêşî li bavê xwe nihêrî, dû re hêdî di mana "erê" de serê xwe ber bi jêr ve hejand.

Wê êvarê heya bi derengê şevê bavê Temo, kalo û pîrê li ser rewşa dinyayê, li ser başî û xerabiyê peyivîn. Adinî rojê, sibehê zû Temo berî hemûyan hişyar bû. Wî herdu destên xwe xistin bin serê xwe û demekê wilo bêdeng, mîna mezinan li zikê xênî nihêrî. Hîn wilo, kalo û pîrê jî rabûn û dawiyê bavê Temo jî rabû ser xwe. Çer ku bavê Temo çavên xwe vekirin, wî li saetê nihêrî,

- Ooo. . . saet tê heftan, got.

87

Dû re ew li Temo zîvirî û peyva xwe domand:

- Divê em herin lawê min, niha diya te di meraqan de mir.

Pîrê zû rabû ser xwe û ji bo xurîniyê tiştin hazir kir. Piştî ku wan xurîniya xwe kirin, ew rabûn ser xwe ku herin; lê berî ew herin, Temo çû destê pîrê maçî kir . Pîrê jî ew maçî kir û got:

- Tu me ji bîr nekî, Temo, divê tu li ser soza xwe bimînî ha!

Temo sê-çar caran serê xwe ber bi xwe ve hejand:

- Erê pîrê, baş e, bi soz ez ê bêm!

Dû re wî xwest ku ew here destê kalo jî, lê kalo destê xwe di ser serê wî re bir û got:

- Ez ê jî bi we re derkevim lawê min.

Bavê Temo:

- Na apo, tu zehmet neke.

- Ma çi zehmetiya wê heye lo?

Law û bav û kalo ji hundur derketin û ber bi sûkê ve meşyan. Pîrê bi dû wan de bang kalo kir:

- Xaço, tu ji dikana Hecî Silêman ji Temo re vezelekî bikirî, baş dibe. Dinya sar e.

Kalo li jina xwe vegerand:

- Erê Wele, baş bû ku te anî bîra min; zivistana îsal dijwar e.

Sar û seqema der weke gûzanan rûyê mirov dibirî. Ku mirov tif fikir tifa mirov qeşa digirt. Ji xwe simbêlê bavê Temo û yê kalo spî bûbûn, mi-rov digot qey berf lê hatiye. Gava li der sermayê da laşê Temo, wî di dilê xwe de got: "Oxx. . . Çi xaniyekî xweş û germ bû. Wele ez ê ji xwe re li ba van mirovan xenê bibim".

Berî ku ew bigihîjine ba dikana Hecî Silêman, Hecî Silêman çav li wan ket, rabû ser xwe û bi devkenî got:

- Kerem bike apê Xaço, ev çendeyek e tu nexuyayî, ma tu çûbû derinan ?

Kalo dîsan wekî hercar henek kin

- Hela tu bisekine em bêne hundur, dû re bipirse camêr.

Hecî Silêman yekî dirêj, lê ne zeyif ne jî qelew bû. Porê wî reş bû,

88

lê herdu cênîkên wî spî bûbûn. Qatek kincên wî hebû, havîn ba, zivistan

ba, wî her ew qatê kincê xwe li xwe dikir.

Kalo:

- Silo, ka tu vezelekî li gorî biraziyê min derxe.

Hecî Silêman li lêwik nihêrî, dû re çû ji dawiya dikanê vezelek anî û got:

- Ev vezelên han nû hatine apê Xaço. Ev vezelên îngilîz in. Weleh tenê ev maye. Ger li lêwik were baş e.

Vezel li Temo hat. Mirov digot qey ji bo wî hatibû çêkirin.

Temo rast çû destê kalo maçî kir. Kalo destê xwe di serê wî da û ji dikandar re got:

- Wî jî li ser hesabê min ê kevin binivîsîne.

Hal û wextê kalo baş bû. Ew ne zêde dewlemend bû, ne jî feqîr bû. Sê-çar dikanên wî yên ku wî didane bi kirê hebûn . Xaniyê wî jî yê ku ji avahiyeke kevnar û kulturî pêk dihat, li ser hesabê wî bû. Di jiyana wî de ji bilî zarokan tiştek ji wî kêr nebûbû û wî hesreta tiştekî nekişandibû. Hesreta wî ya herî mezin kurdûndetiya wî bû. Dikandar ew jî li ser hesabê wî yê kevin nivîsand û deftera xwe dîsan weke berê xiste çavîka masa xwe.

Kalo ji dikandêr pirsî:

- Niha deynê min pir bûye ha !

Dikandar destê xwe li ba kir, keniya û got:

- Eh, ma wê çî bibe apê Xaço?

Dikandar xwest ku ji wan re ji çayxaneyê cîran çayê bixwaze, lê wan nexwestin, tenê cigareke dikandêr kişandin û xatir jê xwestin. Piştî ku Temo û bavê xwe hewcedariyên xwe ji bajêr kirîn, wan ji kalo xatir xwestin û çûn.

Kalo bi dû wan de bang kir:

- Tu Temo bişînî ha! Ji bîr meke!

Bavê Temo:

- Erê erê, em ê wî bişînin.

Temo:

89

- Erê kalo, ez ê bêm !

Berî ku ew bigihîjine gund, diya Temo secadeyek ji postê berxan avêtibû nava milên xwe û ji dûr ve hate pêşiya wan. Gava ew gihîşte ba wan, wê bi heyecan got:

- Ma hûn li ku man? Weleh ji do de xew neketiye çavên min. Ez her li ser xênî bûm û min li riya we dinihêrî. Ku reşek xuya dibû, min digot hûn in û ez diçûme pêşiyê. Çima hûn do venegeriyan? Mêrik hinek ji wan firaxên di destên xwe de dirêjî wê kir û bi devkenî got:

- Hela tu ji kerema xwe re rahêje van firaxan, em ê dû re li ser nehatina xwe bipeyivin.

Jinikê hihek firax ji destên wî girtin û hinek jî ji Temo xwest:

- Ka bavê diya xwe, tu jî hinek firax bide min.

Temo kîsikê şekir dirêjî diya xwe kir. Diya wî ew kîsik ji dest girt û bi kêfgot:

- Weleh we qûtê me yê vê zivistanê hemû danî. Ma qey ciwangeyê we buha hate firotin?

Mêrik keniya, serê xwe hejand û ber bi malê ve meşiyar. Di rê de ne Temo û ne jî bavê wî tu tişt li ser serpêhatiya xwe negotin. Te digot qey wan hevdu temî kiribûn. Lê êvarî, piştî ku wan şîva xwe xwarin, bi çayêvexwarinê re mêrik pêşî qala firotina ciwange kir, dû re jî qala serpêhatiya Temo û malbata kalo kir. Ji ber tiştên ku bi serê Temo de hatibûn, jinikê çend caran kire axeax, çend caran xwe kire qurbana lawê xwe û heya ji kerban çend dilop hêsir jî ji çavên

wê hatin. Wê piştî demeke kurt serpêhatiya Temo ji bîr kir, lê çîroka kalo û pîrê ji bîra wê nedîçû. Piştî ku wê bîskê li Temo nihêrî, berê xwe bi mêrê xwe vekir û got:

- Kuro ma qey tu dêhn î? Ma em ê çawan lawikê xwe bidin sût mûtên bajaran?

- Keçê a dêhn û a ku gotin di serî de naçe, tu î! Ez ji te re dibêjim camêr bi emir in, mezin in, camêr in. Ew tew ne bi emir bin, tew ne bi emir bin, ew di emrê Stê û îso de ne. (Stê û îso gundiye wan 90

bûn û emrê wan li dora şêst heftê salê bûn.) Û Weleh heya niha ez li mirovên wilo qenc rast nehatime.

- Dibêjin, li bajaran zarokan dikirin û wan dibin nava gêwir. Ev jî ne wilo bin?

- Na keçê, ev camêr ne wilo ye. Ew jî weke me ne û ji me jî hîn çêtir in. Her tiştên wan heye, lê tenê tiştê ji wan kêrzarok in. Xwedê mal û pere daye wan. Lê zarok nedaye wan. Ew kurdûnda ne, ew bi hisreta zarokekê ne. . .

Temo peyva bavê xwe birî, li diya xwe nihêrî û got:

- Wele ez dixwazim herim mala kalo û pîrê. Ez dixwazim li ba wan bimînim û ji xwe re herime mektebê.

Diya wî milên xwe li ba kirin:

- Ê, piştî ku tu bixwazî ji min re çî lazim e?

Wan wê êvarê li hev kirin ku ew ê lêwik bişînin ba kalo û pîrê.

Çawa be li gund dibastan tune bû. Wan dixwestin, qet nebe bila Temo ji xwe re bixwîne û bibe tiştêk.

Piştî wê bi hefteyekê dê û bavê Temo digel wî çûne mala kalo û pîrê. Tiştên ku diya Temo di derheqa kalo û pîrê de fikirî bûn, qet ne wilo bû. Gava wê ew germî û mêvanperweriya kalo û pîrê ya li

hemberî xwe dît, ji tiştên ku lê fikirîbû şerm kir. Wê di dilê xwe de gotibû: "Mirovên evqas nefsbîçûk tu caran nehatine dinyayê."

Ew du rojan mêvanê kalo û pîrê man, roja sisiyan jî kalo û pîrê ew bernedidan, lê dê û bavê Temo li ber wan geriyan û gotin:

- Wele destê me ji we nabe, lê hûn bi rewşa gundan dizanin, divê em herin.

Wan Temo li ba wan hişt û ew vegehiyan gund.

Berî niha bi çendeyekî riya min bi gundekî Erzeromê ket û ez li mala dostê xwe Selîm bûme mêvan. Êvarî, piştî şîvan hin gundiyên din jî hatin şevbuhêrka me. Weke civata her gundî, civata me jî bi qerf û henekan dest pê kir û peyv li ser feqîrî û dewlemendiyê ra-
9i

westiya.

Hingî peyayekî navsal û serqot got:

Bavo, hin hene bi qasî dewlemendiya xwe zalim in, bi rewşa feqîr û belengazan nizanin. Ji wan were ew ê xwîna feqîran vexwin.

Hin jî hene, Xwedê dide wan ew jî didine yên din. Temo jî wilo ye; ew bi namûs û bi wijdan derket. Ne ji wî ba, tu zarokên me hînê xwendin û nivîsandinê nedibûn û ew ê jî weke me nezan û cahil rabûna.

Min hingî ji mazûbanê xwe pirsî:

Ev Temo kî ye?

Temo lo, mamostayê gund. Dibêjin, serpêhatiyê wî ya ecêb heye. Ev yeka han, hîn berî ku ez werime gund bûye. Malbata Temo feqîrê gund bûye. Rojekê, xalanê Temo golikekî didinê. Temo golikê xwe xwedî dike û wî mezin dike. Ciwangeyekî baş ji golik derdikeve. Rojekê, dîsan weke gelek caran, tiştê di mala bavê Temo de namîne. Ne xwarin, ne vexwarin, ne jî don... Ew req û rût

û perîşan dimînin. Bavê Temo biryar dide ku ciwangeyê wî bifiroşe. Hem Temo û hem jî diya Temo li hember firotina ciwange derdikevin, lê bavê Temo bi wan dide qebûl kirin û bi Temo re ciwange dibine bajêr. De vir Erzerom e, serma Erzeromê ne weke ya ba we ye. Zivistanan simbêlê peyan bûz digire. Li bajêr serma zorê dide Temo û ew dikeve. Bavê wî jî radihêjê û wî vir de û wê de dibe. Dawî ew wî dibe çayxaneyekê û dide ber sobê. Li çayxanê peyakî kal rûniştîye. Gava kalo bi wî awayî çav li Temo dikeve, ji bavê wî re dibêje: "Rahêje lêwik û bide dû min". Temo dibine mala kalo. Kalo ermeniyekî maldar û kurdûnde bû ye. Kêfa kalo û pîrê ji Temo re tê û ji bavê Temo tika dikin, ku ew Temo li ba wan bihêle. Bavê Temo jî bi diya wî dişêwire û bi riza Temo, ew Temo li ba kalo û pîrê dihêlin.

Kalo wî dide xwendin û dibe mamoste. Wî pir mektebên din jî xwendine lê ez nizanim. Tiştê ku ez dizanim, ew pir zîrek e. Lo ew bi her tiştî dizane. Gundî hemû bi serê wî sond dbcwin. Haa! Min ji 92

bîr kir ez bibêjim. Pêşî pîrê dimire, dû re, hîn berî ku kalo bimire, kalo cihê zêrên xwe ji Temo re dibêje û mal û dikanan jî li ser navê wî dide nivî sandin. Temo jî piştî xwendina xwe û piştî mirina kalo û pîrê xênî û dikanan difroşe, zêran hûr dike û li çar gundan çar dibistanan ava dike.

Dotira rojê ez bi dostê xwe Selîm re çûme mala Temo. Jineke ciwan û devbiken li me derî vekir, bixêrhatinî da me, da pêşiya me û em birin oda ku Temo lê rûniştî bû. Gava Temo çav li me ket, ew ji cihê xwe rabû û destê xwe da me.

Bejna Temo dirêj bûbû, an jî dirêj bû. Wî riha xwe tenê li ser çenga xwe berdabû û simbêlê wî ser lêva wî ya jor girtibû. Berçavkeke

doxzîv û girover li ber çavên wî bû. Gava ew dipeyvî, wî carna ew berçavaka xwe derdixst û dîsan bi paş de dixiste ber çavên xwe. Mezela ku ew lê rûniştîbû, mirov nikanîbû ji pirtûkan gava xwe biavêta. Ne tenê li ser refan, herwisa li ser masê û li erdê jî tijî pirtûk bûn. Temo bîskê ji me re behsa gund û bajaran, jin û mêran, xort û zarokan, xwendin û nexwendinê, azadî û bindestiyê kir. Dû re, gava bala wî kişand ku ez not digirim, wî bi kurtebirî behsa serpêhatiya xwe kir.

Min jî serpêhatiya wî li jor nivîsand.

93

KEVOKADÎLAN

Gava Dîlan bi lotikan ji malê derket, ku here dibistanê; çavên wî li hewşê, li bin darê, li kevokekê ket. Wî pêşî nizanîbû ku ew kevok e. Bi rastî jî mirov nizanîbû ew kevok e. Ji ber ku wê xwe li bin darê melisandibû, stûyê wê bi aliyekî ve xwar bûbû, ling û baskên wê bi aliyê din ve... Lê ji bo Dîlan her yek bû. Kûçik, pisîk, çivîk, kevok û her heywan... Wî bi xwe tu ferq nedixiste navbera heywanan. Dibû ku hin heywanên ew jê aciz bû hebûn, lê dîsan jî wî ji heywanan hez dikir.

Dîlan hêdî hêdî xwe qulûs kir, xwe da ser pozikên solên xwe û ber bi kevokê ve meşiya. Kevokê xwe du sê caran livand ku bifire, lê nikanîbû bifiriya, çend caran kire çivîni û di cihê xwe de rawestiya. Dîlan îcar hêdî di paş darê re çû û ji nişkê ve çakête xwe avête ser wê û ew girt. Gava wî kevok girt û xiste nava destên xwe, ew çav li lingên wê yên şikestî ket, ji wî webû ku wî lingê kevokê şikandiye. Lê gava ew çav li xwîna wê ya hişk ket, hingî ew têgihîşt ku ne wî lingê kevokê şikandiye. Ne tenê lingê kevokê, lê herwisa baskekî wê jî şikestî dixuya.

Dîlan çentê xwe ji pişta xwe kir, li bin darê rûnişt û bi cebirandina ling û baskê kevokê biliya. Dû re wî rahişt kevokê û çentê xwe, dîsan bi paş de vejeriya hundur û çû mezela mêvanan. Wî çentê xwe avête ser masê û bê ku ew solên xwe ji pê bike, derbasî ser xaliyan bû. Ew li nava odê rûnişt, kevok di nava destên xwe de bir û anî û paşê pûrta li dora birênên kevokê rûçikand. Ling û bask li kevokê xilxilî bûn. Lê bask bi parîkî ji lingan çêtir bû. Piştî ku wî pûrta li dora birênên kevokê peritand, ew rabû ser xwe, kevok danî ser masê û xwest ku here hin hevîr û rûn bîne, da pê ling û baskên kevokê bicebirîne. Ew vê yeka han ji pîrika xwe hîn bûbû. Hema ku

94

pizikek an birînek li canê kê bihata, pîrika wî hinek hevîr fikir, dû re hinek rûn li nav dixist û datanî ser pizik û birînên wan û bi paçikekî girêdida.

Piştî ku Dîlan bi du-sê gavan ji kevokê bi dûr ket û çû ber derî, ku derkeve here mezela din, kevokê firek da xwe û xwe li ser textê firaxan danî. Dîlan wextî ji kêfan bifiriya, ew di cihê xwe de rawestiya û li kevokê nihêrî. Kevokê jî li wî nihêrî û du-sê caran nikulê xwe li tacikekê xist. Lê ji livandina kevokê xuya bû, ku wê dixwest liveke din jî bide xwe. Dîlan hêdî kursî kişande bin text, çû ser kursiyê û herdu destê xwe dirêjî kevokê kirin. Gava wî destên xwe dirêjî kevokê kirin, kevok çend caran perpitî û ji ser text firiya. Hingî text ji jor ve di gd firaxan hate xwarê û her firaxek bi derekê de belav bûn. Gava dengên teqereqa firaxan çû diya wî, wê ji mezela din baz da û hate ba Dîlan. Çaxa ew çav li Dîlan, rewşa wî û firaxên hundur ket, weke dêhnan lê hat, herdu çavên wê fireh bûn û ji hêrsan laşê wê lerizî. Ew sibehê zû rabûbû ser xwe û bi maliştin û pakkirina malê ve mijûl bûbû. Ew bi hêrs bi ser Dîlan ve qîriya:

Kuro ma ev çend car in ez ji te re dibêjim, bes e bi van kevokan re bide û bistîne! Ma qey tu nizanî ku rûyê kevokan ne bi xêr e? Dîlan heyşt salî bû, lê ji ber bejna xwe ya kurt di heftan de xuya dikir. Porê wî reş û çavên wî hêşin bûn. Du şanik li ser rûyê wî hebûn. Yek jê li bin çavê wî yê çepê, ya din jî li ser çenga wî bû. Gava wî li mirov dinihêrî, mirov digot qey ew dikene.

Diya wî ber wî çû, bi milên wî girt û ew bi hêrs hejand, Tew ew dikene jî! . . Lê, ma qey xema te ye? Ma qey tu û bavê xwe malê pakij dikin û firax û kincan dişon?

Lê wê bi xwe jî dizanîbû ku Dîlan di rewşên wilo de nakene û ew ji xwe wilo dixuye.

Wê Dîlan berda, çû ku rahêje kevokê biavêje der, lê kevok ji nava destên wê firiya û xwe li ser kulînê danî. Çer ku xwe li ser kulînê danî, zelq kir. Gava diya Dîlan çav li zelqê ket hê bêtir hêrs bû:

-Ha!... Ev ji min kêr bû, ha!...

95

Wê rahişte melkesê û bi êrîş çû ser kevokê. Lê Dîlan xwe avête destên wê, bi dengê bilind û bi nîvgrî got:

- Dev ji kevoka min berde, dev ji kevoka min berde, bêwijdana bêwijdan...

- Lê lê, lê lê, îcar ev ji min kêr mabû ha! îcar lawê min peyvên wilo ji min re bike? Ha ez ê melkesê deynim û tu çî dikî bike. Lê wê bavê te êvarî were malê, ez ê hemûyî yek bi yek jê re bibêjim. . .Lê niha tu çî dikî bike. Ez nikanim bi te re pevbiçinim û cîranan bi xwe bihesînim.

Gava Dîlan ber bi kovokê çû û destên xwe avêtîyê, kevok dîsan firiya. Piştî ku ew çû vî alî û wî aliyê odê, xwe li ser resimê kalikê wî (bavê diya wî) yê ku bi dîwêr ve bû, danî. Lê ew di gel resim ji

jor de hate xwarê û çarçewa resim hûrhûrî bû.

îcar diya wî bû weke dêhnan, bi hêrs û bi dengekî bilind got:

- Zû vê kevokê ji hundur derxîne, zû!

Dîlan bi lez çakêtê xwe avête ser kevokê û ew girt. Gava wî kevok girt, hebekî bêhna diya wî hate ber wê. îcar bi dengekî nizim û weke ku rehet bûbe, got:

- Lawo ji bo xatirê Xwedê vê kevokê bibe li çolekê berde. Tu dibînî bê çi bi serê me de anî . Gerek tu bi lez herî mekteba xwe. Ger vê carê jî tu ji dersên xwe bimînî, wê bavê te li te bixe.

Dîlan hema kevok girt û bi bayê bezê derkete derve. Diya wî bi dû wî de bang kir:

- Dîlan, kuro te çentê xwe ji bîr kir, lawo!

Lê Dîlan li wê venegeriya, wî bi xwe jî dizanîbû ku wî çentê xwe ji bîr kiriye. Lê kevok? Ma qey wî ê ew kevoka kulek û birîndar berdaya çolê? Na, wî xistibû serê xwe ku ew ê ling û baskên kevokê bicebirîne û wê rehet bike.

Ew li serê kuçê sekinî û hebekî bêhna xwe berda. Dilê wî weke defê lêdixist, radibû û dadiket. Xwêdan jî dabû, lê ew qet ne xema wî bû. Wî dîsan lezand. Çend caran daqûl bû, bixuşkên ku diketin solên xwe derdixist, davêt û dîsan dimeşiya. Carekê ji nişkê ve seki-
96

nî û xwe bi xwe got:

- Ma ez wilo serserî bi ku de diçim?

Dû re hevalên wî Ferxo û îso hatin bîra wî. Wî ber bi mala Ferxo ve lezand. Piştî ku qederekî meşiya, dîsan sekinî û xwe bi xwe got:

- No, ez naçim mala Ferxo. Bavê wî her tim bi wî re dixeyide û li wî dixê. Tew ew vê kevoka kulek û birîndar bi min re bibîne, ew ê bi min re bixeyide û erza min bişikîne. . .

Ew li mala îso fikirî. Lê taviî hate bîra wî ku îso çûye gund, mala apê xwe.

Îcar wî ê çî bikira gelo? Ji nişkê ve pîrka wî hate bîra wî. Xwesteka çûyina mala pîrka wî bi wî re çêbû. Mala pîrka wî li gundekî nêzîkî bajêr bû. Ji xwe Dîlan ji zû ve pîrka xwe nedîtibû û gelekî bêriya wê kiribû. Wî dizanîbû ku wê pîrka wî alîkariya wî bike û ling û baskên kevoka wî jê re bicebirîne.

Her ku diçû dinya germtir dibû. Wê bîskê ji barkêşan û çend jinên gundî pê ve tu kes li sûkê nema bûn. Piraniya dikandaran ji ber germbûna rojê dikanê xwe girtibûn û çûbûne malên xwe. Hin dikandarên mêwe û sebze ku dikanên xwe negirtibûn jî, tiştêkî mîna merşekê avêtibûn ser çend daran û ji mêwe û sebzeyên xwe re sî çêkiribûn.

Dîlan di wê kelekela germê de kete riya gund û bi gavên xurt lezand. Gava ew hebekî ji bajêr derket, mîna ku mirov ew di nava avê de kiri be, ew wilo ji xwêdanê şil bûbû. Ew sekinî û bi milê gomlegê xwe xwêdana ser çavê xwe pakij kir. Dû re ew çû ser qûçekê û li gund nihêrî. Gund ji dûr ve di nava leylandê de xuya dikir.

Dîlan ji ser qûçê daket, kete rê û dîsan weke berê bi gavên xurt meşiya. Xwe bi xwe got:

- Ku ez bi ser vî girikê han kevîm ez î li gund im.

Lê wî ev gotinên han bi deng gotibûn, loma wî li dora xwe nihêrîbû; gava li dora xwe nihêrîbû jî, ji dûr ve dîtibû ku traktorek ji aliyê bajêr ve tê. "Xwezî ew traktor di vir de were" Dîlan di dilê xwe de gotibû û meşa xwe domandibû. Wer ku wî xwêdan dabû piça

97

avê di laşê wî de nemabû. Kevoka wî jî tî bûbû. Carna çavên wê dihatin girtin û serê wê bi aliyekî ve xwar dibû. Carna jî ew bêhêz diket

û herdu baskên wê bi wê ve dadiliqyan. Baş bû, mîna Dîlan fikirîbû, bû. Ew traktor ber bi wî ve dihat. Gava traktor nêzîkî wî bû, wî destê xwe jê re hilda û xwest ku wê bide rawstandin. Şofêr firênek bi xîzînî girt, toz û dûxan bi ser serê xwe xist û li kêleka rê sekinî.

Şofêrê traktorê yekî xort bû, di bîstan de xuya dikir. Berçavkeke reş li ber çavên wî bû û porê wî ji tozê spî dikir. Wî berçavka xwe ji ber çavên xwe derxist, bi kujê çakêtê xwe pakij kir û ji Dîlan re got:

- Ma tu ê bi ku de herî?

Ji bo ku ji girgira traktorê deng heriyê, Dîlan bi dengê bilind g^ot:

- Ez ê herim vî gundê ha! . . .

Şofêr berçavka xwe da ber çavên xwe û wî jî bi dengê bilind got:

- De siwar be, siwar be!

Dîlan kirî li kêleka wî siwar bibûya, şofêr nehişt, wî ew şande ereba traktorê. Dîlan bi destekî bi kevokê girt û bi destê din jî li siwarbûna erebê mijûl bû.

Şofêr çend caran li ser hev got:

- De heydê, zû siwar bibe.

Gava ew nêzîkî gund bûn, çend kûçikên xurt bi reyandin êrîşî wan kirin. Bi dû wan kûçikan de cewrikekî biçûk direya û ber bi wan ve baz dida. Gava kûçik gihîştin ba traktorê û şofêr nas kirin, ji xwe şerm kirin; dêlên xwe xistin nava lingên xwe, serên xwe xistin ber xwe û dîsan berepaş ber bi gund ve baz dan.

Şofêr traktora xwe li jêrî gund sekinand. Dîlan ji erebê daket, spasên xwe jê re got û ber bi gund ve meşiya. Dîlan gihîşte ber deriyê pîrka xwe, li ber derî sekinî, li derî xist û kete hundur. Hundir bêdeng bû, pîrka wî ne li mal bû.

Dîlan ber bi kûp ve çû, tasek av hema li ser lingan bi ser xwe de kir. Paşê wî tasek ava din jî dagirt, li ser wê merşika ku li erdê raxis-98

tî bû, rûnişt, hinek jê vexwar, dawiya maye jî da ber kevoka xwe. Bi tirs ku bdkî kevok ji destên wî bifire, wî newêrîbû kevok ji destên xwe berda. Kevokê di nava destên wî de çend caran nikulê xwe xiste nava avê û derxist. Piştî ku têr vexwar, îcar serê xwe xiste nava avê û xwest ku xwe bişo.

Dîlan ji ber bi tirs bû, ku ew bifire û hemû firaxên pîrka wî li nava hev bixîne.

Çaxa pîrka wî gava xwe avête hundur û sewta mirovekî ji hundur hatiyê, ew veciniqî û şaş ma. Paşê gava çavên wê li Dîlan ketin, bêhna wê hate ber wê; ew keniya û bi devê xwe yê bêdiran got:

- Te xêr e Dîlankê min, tu û van deran?

Dîlan jî keniya, ji cihê xwe rabû û çû destên wê maçî kir.

Emrê pîrka wî li dora heftêyî bû. Porê wê spî bû û ji du diranan pê ve diran di devê wê de nema bûn. Herdu gepên wê kort bûbûn û rûyê wê di nava qermîçokan de mabû. Ji ber ku piştî wê tewiyabû, bejna wê pir kurt xuya dikir.

Pa a * a A îre je pirsî:

- Tu çawa yî lawê min, dê û bavê te çawan in?

- Ez baş im pîrê, tu çawa yî?

- Ez jî baş im, bavê pîrê.

Piştî ku Pîrê bi hezar zehmetiyan satila ava xwe berda kûp, got:

- Ma te xêr e vê germê, bavo, ku tu ê bihatayî, tu ê di hênkayê de bihata. Ma kî di vê kelkela germê de ji malên xwe derdikevin?

Çavên Pîrê hîn li kevokê neketibûn, ango ew lê hayî nebûbû. Ji xwe gava mirov ji derve, ji ber rohnê û tîrêjên rojê dikete hundur,

mirov dibû weke koran, hundur pir tarî xuya dikir.

Piştî demekê çavên Pîrê li kevokê ket, wê ji Dîlan pirsî:

- Ew çi ye Dîlan, ma te ew kevok ji ku derê aniye?

- Pîrê, ke . . . kevok birîndar e . . .

- Çima?. . . Ma çi pê hatiye?

- Ling û baskê wê şikestine, pîrê.

Lê gava Dîlan ew gotinên han gotin, lêva wî ya jêr lerizî û girî ke-
99

te qirika wî. Pîrka wî destê xwe di serê wî da, ew haş kir û got:

Na lawê min, a niha ez ê ling û baskên kevoka te bicebirînim.

(Piştî ku wê li ling û baskên kevokê nihêrî, dom kir). Birîna kevoka te ne xedar e, ne ling, ne jî baskê wê şikestiye, lê kevok êşiya ye û birîndar e.

Hingî pir kêfa Dîlan hat, wî wextî tişteke ji pîrka xwe re bigota,

lê pîrka wî berî wî peyivî:

Ma tu ne birçî yî lawê min, tu hinek mast naxwî?

Çawa dê Dîlan ji mêst re bigota na? Ev zêdeyî meheke wî bû, ku devê wî bi mêst nebûbû.

Pîrka wî satila mêst, textê firaxan û selika nê nîşanî wî da û got:

- Tu ji xwe re hinek mast têxe tacikekê û bixwe, ez ê jî hinek hevîr bikim û ling û baskên kevoka te bicebirînim.

Dîlan hema zû ji xwe re hinek mast xiste tacikekê, perçak nanê tenûrê ji selikê derxist û weke gurekî birçî kişiya ser û xwar. Pîrka wî jî hevîr kir û bi hevîr û rûn ling û baskê kevoka wî cebirand.

Êvarî, piştî ku roj çû ava û pîrka wî nivînên xwe li ser xênî raxistin, Dîlan tiştên ku di navbera wî û diya wî de qewimî bûn û hatina xwe ya gund, ya bêî ku ew ji dê û bavê xwe re bibêje, ji pîrka xwe re got.

Pîrka wî bi şaşmayî jê pirsî :

- Ku haya dê û bavê te ji hatina te ya gund tunebin, ew ê niha nebêjin çi? Ma ew ê nebêjin, ka tu bi ku de çûyî? Çima tu bêê destûra wan hatî, lawê min? Weleh niha wan hemû bajar li hev xistine. Niha tu der nemaye ku ew li te negeriyane.

Dîlan dizanîbû ku wî şaşî kiriye û ew bêê haya dê û bavê xwe hatiye. Wî dizanîbû ku niha dê û bavê wî ji hemû hevalên wî yê dibistanê û ji hemû mamostan pirsîne. Wî dizanîbû ku niha dê û bavê wî li her derên bajêr li wî geriyane. Dîlan pir poşman bûbû. Ji ber vê yekê wî xwest pîrka xwe bi xwe re bibe bajêr, da dê û bavê wî wî efil bikin.

Dîlan li ber pîrka xwe geriya:

ioo

- De pîrê, lê. . . Weleh ku bavê min bibihîze ez neçûme dibistanê, ew ê têra xwe li min bixe, ew hew kinc û kitêban ji min re dikire.

- Heh. . . ma qey tu neçûyî mekteba xwe jî?

-Na...

Pîrê kire niçe niç, piştî ku qederekî fikirî, ji ser xênê bangî cîrana xwe kir:

-Xezalê!... Xezalê!...

Xezalê di bin çêlekê de bû, şîr didot. Gava wê dengê pîrê bihîst, ji bin çêlekê rabû û got:

- Kerem bike pîrê.

- Ma gelo wê îşev Mecîd neçe bajêr?

- Na pîrê, ew îşev naçe, lê ez ne şaş bim ew ê sibehê zû here.

Dengê Mecîd ji ser dikê hat:

- Ez ê sibehê zû herim bajêr, pîrê, di berbangê de. . .

- Ma tu ê bikaribî me jî bi xwe re bibî, Mecîd?

- Erê, pîrê, ser çavan... Lê divc hûn sibehê pir zû rabin. Ji ber ku ez ê berî rohilat herim.

Pîrê û Dîlan sibchc zû, hîn bcrî ku roj derkeve rabûn ser xwe û çûne ser rê, li bendî traktora Mecîd sekinîn. Pir tê de neçû, traktor ji gund dcrkct û hatc ser rê, li bcr pîrê û Dîlan rawestiya. Mecîd destê xwe li ba kir û got:

- De pîrê, zû siwar bibin.

Pêşî Dîlan, dû re jî Pîrê, bi alîkariya çend gundiyên ku di erebê de bûn, siwar bûn.

Mecîd pê li gazê kir û xurt ber bi bajêr ve ajot.

Pîrê û Dîlan kirî tckctina hundur, li ber derî, li bavê Dîlan rast hatin. Bavê Dîlan şaş bû, dcvc wî ji hev ma û çavên wî beloq bûn.

Wî wextî tişteke bigota, lê Pîrê firsend neda wî û got:

- Vê carê ji bo xatirê min divê hûn Dîlan bibexşînin. Ew careke din tişteke wilo nake.

Bi dengê Pîrê re diya Dîlan ji hundur baz da hewşê, xwe bê rohnî avête Dîlan, ew çend caran maçî kir û got:

IOI

Ma tu bi ku de çûbûyî lawê min? Me ji do de hemû bajar li hev xist. Ger tu ê biçûya cem pîrka xwe, çima te ji me re negot? Ma mirov weke te dike?

Dû re hemû bi hev re derbasî hundur bûn. Dê û bavê Dîlan li hal û wextê Pîrê pirsîn û Pîrê jî li hal û wextê wan. . . Lê di wê navberê de Dîlan kevoka di hemêza xwe de berda. Kevokê berkurka xwe dagirt, dest bi xwendinê kir û di hundurê odê de çû û hat.

IOI

BARKÊŞÊN BIÇÛK

Ferzend bi lez perçak nan ji teştê derxist, derket û bazda. Deh deqîqe

mabû ku trêna bihata. Ger ew negihîsta ser trêna wê rojê tu tişt bi dest wî nediket. Gava ew gihîşt ber pirê, dengê zûrîna trêna hat. Ferzend zû zû daqûl bû, solên xwe ji pê kir, xist destê xwe û hê xurttir baz da. Gava ew ji pirê derbas bû, di xwêdana de mabû. Lê ew nesekinî, tenê bi piyê qutikê xwe xwêdana ser çavê xwe paqij kir û reva xwe domand. Çaxa trêna gihîste stasyonê, ew hê negihîstibû ba çayxana Beko. Çayxana Beko bi sê-çar sed metreyî dûrî stasyona trêna bû. Ferzend hê bêtir gavên xwe ramedan. Êdî ew gihîşt ser şiva trêna û xwe di ser şivê re avête aliyê din. Gava wî xwe hol kir, lingê wî yê rastê bi hesin ve aliqî, ew kete xwarê û solên wî ji destên wî pekiyan. Hema ew zû rabû, rahişt solên xwe û xwest ku dîsan baz bide. Lê mixabin, wî nikarîbû bazda. Gîzoka wî ya rastê bi carekê ve werimî. Lê wî xwe da ser lingê çepê û bi lez kuliya. Gava ew gihîşt ber trêna, rêwî hemû peya bûbûn û her du-sê zarok li ber çente û kîsên hinekan sekinî bûn.

Ferzend dît ku peyayek du çentên mezin li ber in û cigara xwe dikişîne.

Hema ew zû ber bi wî çû û jê pirsî:

- Apo, ma barkêş ji te re lazim e?

Mêrik bi milê wî girt, dehfa û got:

- Yaho em ji derdê we mirin! Kîjan tê û dibêje, "Apo ma barkêş ji te re ne lazim e?" Ma ka kî ji we dikare rahêje van çentan, lawo?

Her yek zêdeyî çil kîloyî ye!

Ferzend dîsan lê vegeriya:

- Apo, ez dikarim heta bi pêncî kîloyan jî hilgirim. Ma mala te li ku ye?

Mêrik du gav ber bi wî de avêtin û got:

103

- Kuro bi riya xwe de here! Tu barkêş markêş ji min re ne lazim

e, lawo! Ez li bendî texsiyê me! . . .

Ferzend serê xwe xiste ber xwe, neynûka xwe xiste devê xwe û bi riya xwe de çû.

Îbo ji paş de bang wî kir:

- Ferzend! Ferzend! . . .

Ferzend li paş xwe zîvirî, gava dît ku îbo ye, kêfa wî hat û li bendî wî sekinî.

Îbo gihîşt nik wî, destê xwe yê rastê avêt ser milê wî, bi destê çepê pelê pêncî lîrayî di rûyê xwe da û got:

- Min îro ev kar kir. Ma ne baş e, Ferzend?

Ferzend lêva xwe daliqand, serê xwe ber bi jêr ve hejand û got:

- Belê. . . baş e.

- Ka te çiqas kar kiriye?

- Min îro tiştê kar nekiriye. Ez bi diya xwe re çûbûm ser doktor.

Îbo milê wî kişand û got:

- Were em herin ba deriyê binxetê. Wê îro pir kes ji binxetê bîn, em ê riya xwe bibînin.

- Na lo, şofêrên texsiyan nahêlin em li wir barkêşiyê bikin.

- No no, em îro dikarin herin wir. Ez şofêrekî nas dikim, ew ê bihêle em li wir barkêşiyê bikin.

An êşa gîzoka Ferzend derbas bûbû, an jî diêşiya lê wî li xwe danetani ku nîşan bide. Ew bi kulandineke sivik bi îbo re ber bi deriyê binxetê ve meşyan. Ji xwe her røj herdu bi hev re bûn. Gava yekî ji wan tu kar nekira, yê din tiştê ku kar dikir hinek dida hevalê xwe. Wan bi deyn didane hevdu, lê dîsan jî baş bû. Herdu jî pê kêfxweş dibûn.

Îro kêfa îbo li cih bû. Şansê wî ji yê her roj bêtir hebû. Heta bi nîvro wî pêncî lîra kar kiribû. Rojên din wî tu caran evqas pere kar

nedikir.

Îbo û Ferzend di emrê hevdu de bûn. Emrê wan an sêzdeh hebû, an tunebû. Ferzend ji Îbo mezintir xuya dikir. Bi bejnê jî ew jê di-
104

rêjtir bû. Lê Îbo ji wî xurttir û bi hêztir bû. Barên ku wî hildigirtin, Ferzend nikarîbû hilgirta. Ne tenê Ferzend, zarokên din kesî nikarîbûn. . . Ji ber vê yekê ew hatibû naskirin. Ew bi xwe jî pir jîr bû. Wî di karîbû xwe zû têxista çavên mirovan. Ji xwe nava wî û eskerên ber deriyê binxetê pir xweş bû. Ji ber ku ew li Stembolê mabû jî, tirkîya wî pir xweş û baş bû. Gava ew bi tirkî dipeyivî, mirov digot qey ew Stembolî ye. Lê Îro ji her roj jîrtir xuya dikir. Herdem wisa bû, gava şansê wî radibû, ew jîrtir dibû. Girêdana wî ya Îro jî ji ya her roj xweştir bû. Pantorekî tenik, yê ku apê wî jê re ji Stembolê şandibû, li xwe kiribû û şewqeyekî eskeran jî dabû serê xwe. Ji girêdana wî jî xuya dikir, ku ew zîrek e.

Gava ew di ber firnê re derbas bû, Ferzend jê pirsî:

- Îbo saet çi ye ?

Îbo henek pê kir:

- Saet hesin e.

- Na lo, de rast bibêje, saet çiqas e?

Îbo têgihîşt ku kêfa Ferzend ne lê ye, wî nexwest ku zêde henekan bike, li saetê nihêrî û got:

- Saet yek û nîv e.

Ferzend bê kêfserê xwe ber bi jêr ve hejand.

Îbo xwe avêt pêşiya wî û jê pirsî:

- Ferzend, tu ne birçî yî?

Ferzend bersiv neda, di mana "nabûnê" de serê xwe hejand.

Îbo bi destê wî girt, ew ber bi firnê ve kişand û got:

- Bi şeref tu niha birçî yî. Heydê em herin ji xwe re nanekî germ bikirin .

Herdu ketin hundurê firnê, ji xwe re nanekî germ kirîn û derketin.

Dû re îbo ji Ferzend pirsî:

- Dilê te diçe çi? Em ji xwe re çi bikirin?

Ferzend milên xwe hejandin û got:

- Ez nizanim, ma dilê te dihere çi?

- Dilê min diçe xiyar û firingiyan. Em dikarin ji xwe re hinek pe-
105

nîr jî bikirin.

Ferzend bi kêfserê xwe hejand û got:

-Başe.

Herdu bi hev re çûne sûka meywe. Wan ji xwe re hin xiyar, firingî
û penîr kirîn, çûne nav bexçeyekî, li bin siya darekê rûniştin û bi
kêf û henek xwarina xwe xwairin.

Di ser xwarinê de ji nişkê ve îbo got:

Ferzend, ma tu dizanî me çi ji bîr kiriye?

Ferzend serê xwe vir de û wir de hejand û got:

-No!...

Me gazoz ji bîr kiriye.

Ee. . . Em ê çi bikin ji gazozan?

Çi, lo. Welleh vê dinya germê wê gazozên cemidî kezeba mirov
hênik bike. Tu bi a min bikî ez ê herim du gazozên cemidî bikirim
û werim.

Ferzend milên xwe hejandin û got:

Tu dizanî, ku te bivê, here.

Îbo pariyekî mezin ji nê kir, rabû ser xwe û got:

Tu hêdî hêdî bixwe, ez ê niha bêm.

Û wî ber bi dikana herî nêzîk ve lezand. Gava ew vejeriya, berî ku ew bigihîje ba Ferzend bi deh-panzdeh gavan, wî çentekekî jinan ê biçûk dît. Mezinbûna çente bi qasî destekî bû. Çente bi morîkên rengo mengo neqîşandîbû û hin nivîsên erebî li ser hebû. Îbo ji nivîsa erebî fêhm nekir, qeherî, çente di nava destê xwe de guvaşt û got: "Ez di şansê xwe nim, ez tim li çentên vala rast tîm." Wî kirî çente biavêta, lê dîsan neavêt; herdu gazoz xistin destê rastê, çente xiste destê çepê û çû bin siya darê, ba Ferzend.

Gava Ferzend çav li çente ket, destê xwe dirêjî wî kir û jê xwest: îbo, ew çî çente ye? Tu wî çentekî nadî min lo? Çentekekî wilo ji diya min re pir lazim e.

Îbo çente neda Ferzend û rûnişt. Dû re wî devê gazozekê danî ser pîjê darê, bi destê çepê pê girt û bi destê rastê heta ku jê hat li

106
qapaxê xist. Qapax bi carekê ve firiya û hinek ji gazozê rijiya erdê. Wî ew gazoz dirêjî Ferzend kir. Dû re gazozê din jî eynî bi wî babetî devê wê danî ser pîjê darê û bi hêz destê xwe lê xist. Lê devê gazozê venebû. Dû re wî devê gazozê xiste nava diranên xwe û bi diranan lê xebitî. Heta ku jê hat wî diranên xwe lê şidandin. Bi vebûna qapaxê re du diranên wî jî rabûn û devê wî bi derbekê re tijî xwîn bû. Gava ew çav li xwînê ket, pir tirsîya, wisa janê da dilê wî, ku bêî hemdê wî hêsir ji çavên wî hatin.

Ferzend ji wî bêtir tirsîya. Hema wî zû destmala xwe ji bêrîka xwe derxist û xwîna devê wî pakij kir. Lê, xwîn nedisekinî. Her ku tif dikir, kulmek xwîn ji devê wî dihat. Ew zû rabûn ser xwe û berê xwe dane nexweşxanê.

Dinya germ bû. Di wê dinya germê de dîsan sûk tijî mirov bûn. Îbo destê wî yê rastê li ber devê wî bû, çentekê ku li erdê dîtibû jî,

di destê wî ê çepê de bû û bi Ferzend re ber bi nexweşxanê ve dilezandin. Carna jê Ferzend bi gavekê du gavan li dû wî dima. Dest û kincên herduyan di xwînê de mabûn. Yê ku rastî wan dihatin, bi şaşmayî li wan dinihêrîn, heta bi bîst-sî gavî jî dîsan li dû xwe dizîvirîn û li wan dinihêrîn. Berî ku ew bigihîjin nexweşxanê, di nava qerebalixê de, pîrekekê kire qîrîn, xwe avêt çentekê di destê îbo de û got:

A va ye. . . A va ye çentekê min. A va ye bêjiyê ku çentê min ji destê min revand!. . .

Hema polîsekî ji nava qerebalixê hişk bi milê îbo girt û got:

Bide pêşiya min, em herin polîsyanê, bêjî!

Ferzend xwe avêt destên polîs û got:

Lêwik berde. Wî tu çente ji destê kesî nerevandiye. Ez şahid im. Wî ev çente wisa vala li erdê dîtiye.

Polîs li wî zîvirî û hişk bi milê wî jî girt:

Hun şîrîk in, ha! Tu jî bide pêşiya min, bêjiyê heram!. . .

Polîs hişk bi milên herduyan girt û ber bi polîsyanê ve meşyan.

Li polîsyanê komsêr ew jinik û îbo anîne rû hev û ji jinikê pirsî:

107

Tu bi cih dizanî ku vî lawikê çentê te ji destê te revandiye?

Jinikê ziq li îbo nihêrî. Gava ew çav li xwîna ser çavê wî û ya li ser kincê wî ket, ew şaş ma. Lê wê çi bigota? Çente çentê wê bû û wê çentê xwe baş nas dikir. Lê baş nedihate bîra wê, bê lawikê ku çentê wê revandibû çawa bû û kincên wî çi şikil bûn.

Jinikê wisa qederekî li îbo nihêrî û bê deng ma. îbo stûyê xwe xwar kiribû û carê xwîna ku ji devê wî dihat, bi pişta destê xwe paqij dikir.

Komsêr îcar bi ser jinikê de qîriya:

Yê ku çentê te ji destê te revandiye ev e?

Jinikê bi cih nizanîbû, lê gava ku komsêr bi ser wê de qîriya, got:

- Erê, ev e!

Komsêr rabû ser xwe, destên xwe dane paş qûna xwe û du caran di hundur de çû û hat. Pasê ber bi zarokan ve çû, bi guhên wan girt, serê wan li hev xist û got:

- Hûn in, ha!. . . Ji bo çi hûn diziyê dikin ker lawê keran?

Piştî ku îbo xwîna devê xwe paqij kir, got:

Em ne diz in. Min tu carî jî dizî nekiriye. Min ev çentê han wilo vala li erdê dîtiye. Me berde, ez herim nexweşxanê.

Komsêr dîsan serê wan li hev xist. Dû re wî bang du polîsan kir û ew avêtin nezareocanê.

Gepa îbo werimî bû, bûbû weke nepoxekê. Wer ku janê dida dilê wî, ew nikarîbû di cihê xwe de rawestiya. Digiriya. Lê giriyê wî tim di qirika wî de dima. Giriyê wî ne ji tirsan, an jî ji ber jana dilê wî bû, giriyê wî ji qehran bû.

Ferzend jî digiriya. Ew wisan aciz dibû, ku wextî biteqiya. Mîrata nezaretxanê çiqasî bi wan zor dihat.

Piştî ku Ferzend du-sê caran di hundirê nezaretxanê de çû û hat, paşê keserek kûr berda û ji îbo pirsî:

- îbo, ka devê xwe veke ez lê binêrim.

îbo bi zorê lêvên xwe ji ser hev hilanîn û devê xwe vekir.

Diranên wî ji kokê de rabûbûn. Goştê şûna herdu diranan wek

108

du kurmukan bi asmanê devê wî ve daliqiyabûn. Xwîna ku jê dihat sorereş û tîr bû.

Ferzend çavên xwe girtin û serê xwe hejand. Dû re hêdîka di guhê wî de kire pistînî:

Ez tiştêkî bêjim tu ê bi a min bikî, îbo?

îbo di miqamê "erê" de serê xwe ber bi jêr ve hejand.

Ka çi qas pere bi te re hene?

îbo bi herdu destan li bêrîkên xwe geriya, perên ku hebûn derxist û hejmart:

Çil û yek û nîv.

Dû re Ferzend jî perê xwe derxist, piştî ku hejmart, ji îbo pirsî:

Tu dizanî em ê çi bikin? Tevlî perên min pêncî û şeş lîra çêdibin.

Em ê bêjin ku me çente li erdê dît û perên ku tê de hebûn hew ev bûn. Dibe ku ew jinik jî qebûl bike. An na em nayên berdan.

Ku em çend saetên din jî di vir de bimînin, wê êşa diranên te zêdetir bibe û wê dilê te ji ber biêşe.

îbo li ser tûtikan rûnişt. Serê xwe xiste nava çokên xwe û qederekî fikirî. Dû re rabû ser xwe, çend caran di hundurê nezaretخانê de çû û hat, paşê li Ferzend zîvirî, serê xwe kil kir û got:

No, çê nabe. Ew bi vî awayî me bernadin. Tew wê sûcê me girantir bibe.

Ferzend dîsan bi nermî jê re got:

Em bêjin nebêjin, em girtî ne. Jinik çentê xwe nas dike. Lê ku em bêjin me çente li erdê dîtiye û perên ku tê de hebûn hew ev in, wê çaxê dibe ku em bêne berdan. Hingî dibe ku jinik jî bi wijdan derkeve û di me bubuhure. Ma te nedît, gava komsêr jinik anî hemberî te bê ew çawa difikirî û bi dilşewatî li te dinihêrî.

îbo bi dengêkî ne zelal got:

Baş e, em wisa bikin.

Pir tê de neçû, polîsekî dirêj û bi navmil, darek di dest de bû, deriyê nezaretخانê vekir û kete hundur.

Herdu zarok li quncika nezaretخانê li ser çimento rûniştibûn.

Gava polîs kete hundur, herdu jî ji cihên xwe rabûn û stûyê xwe xwar kirin. Polîs ber bi wan çû, darê xwe xiste nava çîpên xwe, bi guhên wan girt, serê wan li hev xist û bi dengekê gur got:

Destên xwe vekin!

Zarok di cihê xwe de sar man, ji tirsan çokên wan lerizîn.

Polîs heryekê darek li çokên wan xist û bi ser wan de qîriya:

Min ji we re got, destên xwe vekin!

Ji ber ku Ferzend li aliyê polîs bû, pêşî wî destên xwe vekirin. Polîs heta ku jê hat darê xwe bilind kir û xwest ku li destên Ferzend bixe. Lê Ferzend destên xwe revand, darê polîs li erdê ket. Îcar polîs hêrs bû. Çend dar li ser hev li pişt û navmilên Ferzend xistin.

Ferzend kete xwarê. Polîs daqûl bû, bi milê wî girt, ew rakir ser lingan û dîsan jê re got:

Destên xwe vekin!... Ger tu îcar jî destên xwe birevînî, ez ê te bikujim!...

Ferzend herdu destên xwe dane ser hev û ber bi polîs ve dirêj kir.

Polîs dîsan heta ku jê hat darê xwe bilind kir û li destên Ferzend xist. Wî wisa pênc-şeş dar li ser hev li destên Ferzend xistin. Destên wî bi derbekê re reş û şîn bûn û werimî.

Polîs dû re vegeriya ser îbo û got:

Tu jî destên xwe veke!

Îbo giriya. Wî ji tirsan êşa diranên xwe ji bîr kiribû. Gepa wî wisa werimî bû, ku mirov digot qey pariyek nanê mezin di devê wî de ye. Îbo destên xwe venekirin û bi pas de vekîşiya. Polîs bi hêz bi milê wî girt û ew ber bi xwe ve kişand:

Ez ji te re dibêjim, destên xwe veke, bêjî!. . .

Çima ez ê destên xwe vekim. Tu sûcê min tune ye, min çente

vala li erdê dîtiye.

Polîs dîsan bi ser de qîriya:

Ez ji te re dibêjim, destên xwe veke!

Îbo dizanîbû ku ew destên xwe veneke, dê çend dar zêde lê bikevin.

Wî bi tirs herdu destên xwe dane ser hev û ber bi polîs ve dirêj

no

kir. Polîs bi hêz du dar lê xistin, darê sisiyan îbo destê xwe kişand û

kire qîrîn. Dengê wî di polîsxaanê de olan da. Bi qîrîna wî re, jinika

xwediya çente ber bi nezaretxaanê ve baz da, lê ji tirsan dîsan berepaş

vegeriya.

Dû re polîs bi milên herduyan girt û ew birin odeya komsêr.

Komsêr bang jinikê jî kir. Jinikê herdu destên xwe dane ser hev û

kete hundurê oda komsêr. Îbo wisa di bin çawan re li jinikê dinihêrî,

ku xwîna wê têketa dest wî, wî dê vexwara.

Komsêr bi dengekî gur ji jinikê pirsî:

- Ev zarok dibêjin, hew pêncî û şeş lîra di çente de hebû û dibêjin

ku wan çente li erdê dîtine. Tu çi dibêjî? Tiştên ku ew dibêjin

rast in?

Jinik hebekî fikirî. Wê ew lawikê ku çentê wê ji destê wê revandibû,

anî bîra xwe. Di dilê xwe de got, "Lawik jî di emrê van zarokan

de bû. Lê ez çi gunehên wan têxim stûyê xwe, min rûyê lêwik nedît.

Ez nizanim ka lawik di çi şiklê de bû û kincên wî çawan bûn."

Dû re wê ziq li îbo û Ferzend nihêrî. Herdu zarokan destên xwe

danîbûn ser hev û stûyê xwe xwar kiribûn. Destên herduyan reş û

şîn bûbûn û werimî bûn. Xwîna ku ji devê îbo hatibû, li ser rûyê wî

hişk bûbû. Gava jinikê herdu zarok di wê rewşê de dît, weke ku

agir têkeve dilê wê, wilo dilê wê bi zarokan şewitî. Dû re wê berê

xwe bi komsêr vekir û bi tirkîyeke ku bi zorê dihate fêhm kirin,

got:

Yê ku çentê min ji destê min revandiye, ne ev e.

Gava îbo û Ferzend hatin berdan, wan rast berê xwe dane nexweşxanê.

Di rê de îbo bi hêrs got:

- Ez di şansê xwe nim. Şansê min her tim wisa xerab e. Roja ku ez çend qurşan kar bikim, ew ê her tim bobelatên wisa bi serê min de werin. Ew ê her tim tiştin bibe. Ma nayê bîra te Ferzend? Nayê iii

bîra te ku careke din jî eynî wisa bi serê min de hatibû. Dîsa çi bûbû?

Hii. . . Hingî Walî hatibû vir. Bi derewan gotin, ku yanî min ji

Walî re xeber daye. Rabûn ez girtim û dîsan weke îro ez dame ber kulm û daran. Şansê min xerab e! Şansê min tune ye! Ez di şansê xwe nim!...

Ferzend henek pê kin

- Ku şansê te hebûya wê diya te tu keçik bianiya.

Bi vê gotina Ferzend îbo êşiya. Ew xwîna hişk, ya ku li bin çenga, wî mabû, bi neynûkan xeritand û bi kdogirî got:

- Bes e, lo, Ferzend! Tu jî her tim henekê xwe bi mirov dikî. Weleh hevaltiya bi te re heram e.

Ferzend li ber wî geriya:

- Min henek kir îbo, ez peyva xwe bi paş de digirim.

- Çi, lo! Tu her tim wisa dikî. Ma qey kêfa te bi vê rewşa me tê?

Ferzend dîsan got:

- Wdeh min henek kir, malxerab. Ma wê çawa kêfa min bê?

(Destê xwe avêt ser stûyê wî) min bibexsîne, ez peyva xwe bi paş de digirim.

Herduyan li çavên hevdu nihêrîn, kenyan û bi gavên xurt ketin hewşa nexweşxanê.

Li hundur nexweşxanê mirov ax biavêta li erdê nediket. Nêzîkî pêncî-şêst kesî li ber deriyê oda doktor hatibûn ser hev. Mirov ji lixwekirina wan dizanîbû, ku piraniya wan gundî bûn. Nêvî ji wan jin û zarok bûn, nêviyê din jî kal û pîr bûn. Yê herî li dawiyê kalekî rihspî, bi şdwer û şewqe, bi wê pişta xwe ya tewiyayî xwe dabû ser gopalê xwe û laşê wî mîna hêlkanê dihejiya. Lê pêşiya kalo jî jineke ciwan, biskên wê yên reş wek serên du maran di bin kofiya wê ya kesk de dixuya, hêsirên ku ji çavên wê yên şîn dihatin pakij dikir û bi gotinên xwe yên xweş zaroka di hemêza xwe de haş dikir. Ser çavê zarokê ji pizikan winda bûbû. Ji girî qet tebatî nedikete keçikê. Her ku diya wê ew ditepand û dixwest wê haş bike, mêşên ser çavên wê difiriyan, bîskê li hundur digeriyan û dîsan bi paş de dihatin

112

xwe li ser rûyê keçikê datanîn. Lê çend mêşên ku ji ser rûyê keçikê firiyan, çûn xwe li ser rûyê îbo danîn û xwestin wê xwîna ku li ser çenga wî hişk bûye, bixwin. Lê îbo bi hêrs destê xwe li ser çavê xwe xist, destê wî li şûna diranên wî yên rabûyê ket, êşiya û janê da dilê wî. îbo bi dengekî bilind kire axîn. Bi axîna wî re hemû li pişt xwe zîvirîn û li wî nihêrîn.

îbo li ser tûtikan rûnişt, serê xwe xiste nava herdu çokên xwe û xwe epişande ser hev. Ferzend jî li ba wî rûnişt. Çend hebên din jî li ser wan kom bûn. Gava hemşîrê deriyê daîra doktor vekir, ew kesên ku li ser wî kom bûbûn hemû reviyar cihên xwe. Hingî herdu zarok jî rabûn û ber bi deriyê odeya doktor ve baz dan. îbo kirî destê xwe biavêta deriyê odeya doktor, peyayekî girs û bi simbêlên boq bi destê wî girt û bi ser de qîriya:

- Tu dikî bi ku de herî bêjî! Here têkeve dorê!

Ferzend got:

- Diranên wî rabûne apo, berde bila têkeve hundur.

Mêrik hema bi lez bişkokên gomlegê xwe vekirin, birîna xwe nîşanî wî da, bi hêrs û bi dengekî gur got:

- Ma diranên wî ji vê birîna min xerabtir e. Erê?

Birîna mêrik şûna kêrekê xuya dikir. Pêşî bi ta hatibû dirûtin, paşê bi çengelan bi hev ve hatibû cebirandin. Lê du çengel jê vebûbûn. Ji ber vê yekê nêmeke zer ji birînê dihat. Xwîneke reş jî li dor birînê hişk bûbû.

Gava Ferzend çav li wê birînê ket, diranên xwe qiriçandin û çavên xwe girtin. Serê wî gêj bû, dilê wî li hev ket û wextî verişiya.

Mêrik dîsan got:

- De bêje ha, ma diranên wî ji vê birîna min xerabtir e?

Ferzend tişt negot. Îbo jî destê xwe avête gepa xwe û dîsan çû li dawiya mirovan, li ser tutikan rûnişt.

- Ger wilo be heya bi êvarî dor nagihîje me, Ferzend got. Ma tu nabînî ji saetekê carekê yek nakeve hundur.

Îbo:

113

Ma em çi bikin? Ma em ê çawa bi vî awayî herine mal?

Ferzend milên xwe hejandin û tiştê negot.

Piştî demekê dîsan deriyê oda doktor vebû, lê îcar hemşîrê bang kesî nekir. Doktor çakêtekî spî heya bi çongan lê bû, cigara wî di devê wî de bû, berçavka wî di dest de bû û di ber wê koma mirovan re derbas bû û çû oda çayvexwarinê.

Li odê sê-çar doktorên din jî rûniştibûn, çayê û cigara wan li ber wan bûn, dipeyvîn, henek dikirin û dikeniyên.

Doktor jî ji xwe re çayek dagirt, li ba wan rûnişt û bi wan re kete sohbetê.

Nexweş her di dorê de bûn û bê sebir çavên wan li riya doktor bûn. Deh deqîqe derbas bû, doktor nehat, bîst derbas bû, nehat, nîv saet derbas bû nehat. Lê tenê dengê ken û henekên wan dihat.

Kalekî ji nav wê komê bang kir:

- Lawo hela yekî ku bi tirkî dizane here bang doktor bike. Ma em ê heya kengî li vir bin? Niha ne tirimpêlên gund mane, ne tu tişt. . . Ma em ê îşev xwe çawa bigihînin gund?

Hingî Ferzend çû, li derî xist û kete hundur. Lê ew qet li Ferzend hayî nebûn, ken û henekên xwe didomandin.

Ferzend çend caran li ser hev got:

- Doktor beg, doktor beg!

Lê doktor her bi dengê xwe yê gur kenê xwe didomand.

Ferzend dîsan got:

- Doktor beg, doktor beg!. . .

Çi ye? Derkeve derve!

Ferzend derneket, dîsan got:

-Doktor beg, tu...

Derkeve derve, min ji te re got. '

Ferzend serê xwe xiste ber xwe û bi hêrs ber bi nexweşan ve çû. Bi dû wî de jî doktor derket, bi bayê bezê deriyê oda xwe vekir û kete hundur. Piştî ku doktor kete hundur bi çend deqîqan, hemşîre derket.

Bi derketina hemşîrê re, nexweşên ku di dorê de bûn ber bi de-

114

rî ve kişyan ku têkevin hundur. Lê hemşîrê nehişt û got:

- Saeta doktor îro xdas bû, ew hew dikare kesî bigire hundur. Lê hûn dikarin sibehê dîsan werin. Gava hûn hatin dora xwe jî ji bîr nekin.

Çend kesên ku li dawiyê bûn xwe dane pêş, ku ji hemşîrê re tiştêkî

bibêjin, lê hemşîrê zû derî girt.

Hum û gum kete navawê koma mirovan, yê ku di ber xwe de ji doktor û ji hukûmetê re xeber dan, yê ku ji rewşa xwe re kufur bûn û yê ku hêrs bûn û nizanîbûn ku ew ê ji hêrsan çî bibêjin. Bi wî awayî hemû hêdî hêdî ji hundurê nexweşxanê derketin.

Wê roja ku berî niha bi saetekê paş stûyê mirov disewitand, teyr û teba, kûçik û heywanên din hewcedarî siyê dikirin, niha bê tesîr mabû. Ew jî mîna wan nexweşan hêdî hêdî winda dibû. Hin ji gundiyan ji bo ku bigihîjin ser dolmîşên gund, bi gavên xurt ber bi cihê dolmîşan ve lezandin. Yê din jî hêdî hêdî dil bi kul û keder meşîyan. Îbo û Ferzend jî bi wan re dimeşîyan. Îbo ji ber êş û jana diranê xwe êşa destên xwe ji bîr kiribû. Wî jî bi xwe nikarîbû, her zimanê xwe di şûna diranên xwe yê rabûyî de dibir û dianî. Hingî wî hê bêtir êş hîs dikir.

Ferzend ji nişkê ve bi milê wî girt:

- Min dît!

Îbo şaş ma:

- Te çî dît?

- Dermanê diranê te. Min dermanê diranê te dît. Dermanê diranê te xwê ye. Ji xwê pê ve tu tişt alîkariya diranê te nake. Em ji sibehê de bê sebeb li vê nexweşxana mîrat sekinî ne. Dermanê diranê te ji xwê pê ve ne tiştek e. Berê li gundê me diranê kê diêşîya xwê datanîn ser. Yê hinan jî bi şîşa sor dikewandin. Lê diranê te kurmexwarî nebûne. An na me dikarîbû bi şîşeke sor bikewanda. Lê niha dermanê diranên te xwê ye. Xwê bi carekê ve dikewîne.

Îbo pê keniya:

- Malxerabo, ma ji ku xwê dikewîne? Xwê mala mirov xerab di-

«5

ke, dişewitîne.

- Hela tu bi a min bikî bê dibe an nabe.

- Baş e, ez ê bi a te bikim.

Edî ew ketin nava sûkê, di ber çend dikanan re derbas bûn û çûne dikaneke nas. Hinek xwê ji dikandêr stendin û derketin derve.

Gava ew derketin, li ber devê dikanê, çavên wan li hevlekî wan bi navê Ziya ketin. Emrê Ziya li dor çardehan bû. Bejna wî dirêj bû.

Gava ew dimeşiya, ew bi hêlekê dibû. Her tim çakêtekî eskeran lê bû. Kebabek di nava nanekî tenik di dest de bû û dbcwar. Ziya bi xwe li wan hayî nebûbû, lê Ferzend bang wî kir:

- Ziya, Ziya!

Ziya li paş xwe zîvirî, qertek din jî li nanê xwe xist û bi lez ber bi wan ve çû.

- Kuro min bihîst hûn hatibûn girtin.ma rast e?

Ferzend:

- Erê, rast e. Ma te çi kir îro?

- Hii. . . min çi kir?. . . îro kar weke axê bû.

Wî bi destekî bi kebaba xwe girt, destê din jî xiste bêrîka xwe û neh deh pdên deh lîra û pênc lîra derxist û nîşanî wan da:

- A min îro ev kar kirin. Ger min bixwesta, min dikarîbû hê bêtir kar bikira. Hûn jî dev ji kar berdidin û diherin çentê xelkê ji destên wan direvînin. Şerm e, şerm. Ma qey gunehê we bi gundiyan nayê? Kî dizane bê rebenê bi çi awayî ew pere bi dest xistibûn. Weleh min ev ji we nedipa. îro bajar hemû bi we dizanin. Hew kes tu karî jî bi we dikin. Ferzend bi milê wî girt:

- De hda tu bimeşe, lo !. . .

Hersê bi hev re meşyan, ji nava dikanan derketin û çûne cihekî xalî. Ferzend xwest wê xwêya ku ji dikandar stendibû deyne ser şûna

diranên îbo.

Heta wê kêlîkê jî Ziya bi çîroka diranên îbo nehesiyabû. Gava ew çav lê ket, xwe avêt herdu milên wî û bi hêrs jê pirsî:

- Çi bû ye îbo? Te û hinan li hev xistiye? De bêje! Çi bû ye?

116

îbo bédeng ma:

Ziya dîsan milên wî hejand:

- De bêje ha, ma çi bû ye?

Ferzend Ziya da aliyekî û ew xwê danî ser. Gava wî xwê danî ser, janekê da dilê îbo, ji cihê xwe pekiya, kir qîrîn û herdu destên xwe avêtin devê xwe.

Ziya êdî hêrs bû:

- De ka bêjin ha! Ji bo çi hûn ji min re nabêjin?

Ferzend bi kurtebirî serpêhatiya xwe jê re got. Lê Ziya dîsan bawer nekir.

- Na, na. De bibêjin, rast bibêjin.

- Bi şeref ez rast dibêjim, Ferzend got. Ma çima em ê derewa bikin?

Edî kete serê Ziya. Diranên xwe qiriçandin û serê xwe hejand.

Ew jî carekê wilo bê sebeb hatibû girtin. Îşkence û lêdan lê hatibû kirin. Şevê eskeran girtibûn ser mala wan û ji berdda birayê wî yê mezin ew girtibûn. Herçiqas Ziya li ber xwe dabû û gotibû, "Ez cihê birayê xwe nizanîm" jî, dîsan pere nekiribû. Eskeran ew kiribûn felaqê û heta ku binê lingên wî werimandibûn, lê xistibûn û gotibûn, " Cihê birayê xwe ji me re bibêje." Ne Ziya, ne jî dê û bavê Ziya nizanîbûn ku lawik bi ku de çûye. Lê dawî dawî li pişt qereqoleke eskeran meytê wî hatibû dîtin. Hingî Ziya hatibû berdan. Piştî wê girtina xwe, ew careke din jî hatibû girtin. Cara duduyan ku ew hatibû berdan, êdî wî xwestibû ku ji bajêr here. Lê ew ji xwe re li

hevalan digeriya.

Ziya destê xwe yê rastê kir hutik, li kefa destê xwe yê çepê xist û got:

- Wddi heyata li vî welatê heram e. Heqê mirov ji vir bar bike û here cihekî dût. Lê hûn dizanin, werin em herin bajarên mezin. Em herin bajarekî dût, bajarekî ku tirs û birçîbûn lê tune be. Bajarekî ku esker bi şev û roj li kuçan nagerin. Bajarekî ku polîs zarokan nagirin, li wan naxin û îşkencê bi wan nakin. Werin, werin hevalno "7

em herin!... Em herin îzmîrê, herin Stembolê, herin Enqerê... Em herin dût. . .

Îbo peyva wî birî:

- Ma qey çûyina wan deran rehet e? Divê perê mirov hebe. Bajarê ku mirov heriyê, divê nasê mirov lê hebe. An na mirov ê ji birçîna bimire. Bajarên mezin ne weke bajarên biçûk in. Xdk hevdu li kuçan dikujin. Ma te wî çendê berê gazete nexwend? Di rûpdê pêşî de resimê jineke kuştî hebû. Di ser resim de jî bi herfên mezin ni-vîsîbûn, ku jinek sî û çar salî ji bo bazinên xwe yên zêr heft kêr xwaribûn. Paşê wan destê jinikê jê kiribûn û tevlî bazinan revandibûn. Kesî nizanîbû bê kê ew yeka han kiribû. Polîs şop nebiribû ser tu kesî.

Ziya:

- Na, lo. Gazete zêde tistan mezin dikan. Nêviyê gundiyan me li îzmîrê ne, rojekê tiştê bi yekî ji wan nehatiye. Ger mirov kar û îşê xwe bike û pozê xwe nexwe nava kar û îşên xelkê, tu kes jî îşê xwe ji mirov naynin. O tu dibêjî gerek nasê mirov hebin. Çi nas û çi hal... Wddi bajarên mezin cenet in, cenet... Tenê ku em xwe bi wir ve bigihînin bes e. Ku em bigihîjin wir her tişt li min. Cihê razanê,

pere, kar. . .

Ferzend xwe avêt ortê:

- Ma tu kesî li wan bajaran nas dikî?

- Lo lo, ma ez kesî nas dikim, nîvê gundiyên me li îzmîrê ne. Karên hemûyan jî baş e. Hin ji wan şeytanokan difroşin, hin ji wan fêkî, hin cigaran û yên hinan jî dikan û çayxanên wan hene.

Gotinên Ziya di serê îbo û Ferzend de cih girtin. Heta bi wê deqîqê jî ew qet li çûyina bajarên mezin nefikirîbûn.

Ferzend ji Ziya pirsî:

- Ê baş e, va em çûn, ka kî ê ji me re kar bibîne?

Ziya keniya:

- Tu dîsan qala kar dikî. Malxerab, ez dibêjim nîvê gundiyên me li îzmîrê ne. Ma qey yekê ji wan ji me re kar nebîne? Bi firotina ci-

118

garan mabe, em ê tibabek pere qezenc bikin. Piraniya zarokên gundiyên me yên di emrê me de li wir cigaran difiroşin. Ku em rojê bi tenê deh pakêt cigare bi-firoşin wê roja me derkeve. Ne tenê deh, lê ez baş dizanim ku em ê rojê bîst pakêtan jî bifiroşin.

Wî kaxez û pênûs ji bêrîka xwe derxist, li ser lingan nivîsand û peyva xwe domand:

- Ger em rojê bîst pakêtan bifiroşin, her. yekî sed lîra di destên me de dimîne. Ew jî ez liba kirîna pakêtê bi deh lîran dihesibînim.

Ku em li ser hev bikin, em ê liba pakêtê bi heşt-neh lîran jî bi dest bbcînin. Rojê sed lîra ne hindik e. Ew jî karê cigarefirotinê tenê çend saet in. Em li vir ji şefaqê de radibin û heya bi roava kar dikin, bi zorê pêncî wereqe di destên me de dimîne. Rojînan jî em destvala vedigerin malê. Wddi hûn bi a min bikin, a em ê niha herin. Lê hûn dizanin, li wir esker mesker jî tunene.

Îbo:

- Belkî gundiye te tenê alîkariya te bikin. Ma ew ê ji ku ji me hersiyan re kar bibînin û me bi cih bikin?

- Ew li min. Razana we jî, kar jî, pere jî. . . Her tişt. . . Her tişt li min.

Ferzend:

- Baş e, em ê heqê rê ji ku bînin? Ê min tu perê min tune ye.

- Ê min jî tune ye, îbo got. Û ji bo ku em bigihîjin heta îzmîrê an Stembolê, divê bêrîkên me tijî pere bin. Ez bê pere naxwazim herim tu cihî. Yê min ez hew dikanim bisekinim, şûna diranên min diêşe. Bi xatirê we.

Ew kirî ber bi mal ve bimeşiya, lê Ziya ew da rawestandî û got:

- Wêêew. . . hûn çî tirsonek in lawo? Bila cesaret bi we re hebe gidî.

Heqê rê çî ye? Em ê tavilê peyda bikin. Nebû, em ê herin ser rê "9

û bi tirekê herin.

Hesê heval jî ber bi mal ve meşyan. Malên hersiyan jî hebekî li derveyî bajêr bûn. Heta ku ew gihîştin malê jî wan her qala çûyina xwe û bajarên mezin kirin.

120

CIGAREFIROŞ

Marlboro!... Kend... Marlboro!...Kent!... Marlboro...o...

Poîlsên sivîl dora wî girtin. Ne yek, ne du; sê dolmîş tijî polîs, hemû jî polîsên sivîl û ji şuba duwemîn bûn. Gava Bozan çav li wan ket, baz da û kete nava qerebalixê. Ji wî webû ku ew xelas bû, lê hew nihêrî ku destek li nava milên wî ket:

- Tu ê bazdî, ha!... De bazde! Çima tu baznadî, bêjî lawê bêjiyan?

Ev çend car in em dibêjin: "Li vir cigaran mefiroşin". We ev

Îzmîra weke gulekê kire gû! We gû xiste nava vî bajarê weke zêr!
Dû re polîs bi milê wî girt û ew bire ba dolmîşê.

Di hundurê dolmîşê de sê nefer polîs hebûn. Hersê jî navsal û rûtirş
bûn. Ew polîsên ha bekçiyên zarokên ku wê bihatina girtin,
bûn. Polîsê ku Bozan girtibû, pehînek lê xist, ew avête hundurê
dolmîşê û ji yê hundurê dolmîşê re got:

- Ha ji we re, em ê hemûyan bigirin, em ê koka wan biqelînin.

Yekî ji nava polîsan kulmikek li çenga Bozan xist û got:

- Hey bêjî, ma hûn nizanin ku firotina cigaran li vir qedexe ye?

Ma hûn nizanin ev cigare qaçax in? Ma hûn nizanin qaçaxkeriya
cigaran qedexe ye, qedexe. . .

Paşê bi guhê wî girt, diranên xwe qiriçandin û got:

- Hda tu derseke baş li polîsyanê bistîne, hingî dê hişê te bê serê
te, hingî tu ê fêhm bikî bê ev gûxwarinê qedexe ye an na?

Bozan hê zarok bû, du mehên wî mabûn ku ew yanzdehan dagire.

Bi lêdana wan xwînê di nava diranên Bozan de pijiqand. Xwîna
ku ji devê wî hat, li ser qoltixên dolmîşê bdav bû.

Polîs kulmikeke din jî li çenga wî xist û bi ser de qîriya:

- Xwînê daqurtîne, xweziya xwe daqurtîne, bêjî! Tif meke ser

121

qoltixan!.

Xwîndaqurtandin, xwezîdaqurtandin, di wê kêlîkê de li ber Bozan

ne tiştekek bû. Hişê wî li ser hersê pakêt cigarên wî bû. Wî ew

hersê pakêt jî ji cigarefiroşê wê taxê deyn kiribû. Li her taxekê serokekî
cigarefiroşan hebû. Wî serokî bi deyn cigare difirote zarokan.

Gava zarokan di hundurê rojekê de perên wî li venegerandina, cihê

wan li wê taxê nedima. Wan hew dikarîbûn li wê taxê cigare bifirota.

Tirsa wî ya herî mezin razana girtîgehê bû. Ji ber ku apê wî Kdeş

deh salan di girtîgehê de raza bû. Gava ew hatibû berdan, wî ji wan re û ji hemû nas û dostan re behsa rezîlî û perîşaniya girtîgehan kiribû. Bozan ji tirsan dilerizî, xwe negirt û giriya. Paşê ew li ber polîsan geriya ku wî berdîn.

Îcar polîsê kû li paşiyê rûniştibû, xwe di ser qoltixan re dirêj kir, destê xwe bi hêz li ser çavê wî xist û got:

- Hişşş, bêjî!. . . Ker lawê keran! Lawê qehpê digirî jî!. . .Hîn polîs peyva xwe dom dikir, dîtî ku yekî din jî bi kulm û pehînan kete hundurê dolmîşê. Polîsê ku lawik avête hundur, ji polîsên hundurê dolmîşê re got:

- Me îro ev girtin, lê em ê reha wan biqelînin. Hela em derseke baş li polîsyanê bidine van, ew ê hingî tê bigihên bê firotina cigaran qedexe ye an na. Ew ê hingî hişê wan were serê wan.

Polîsê şofêr ji yê din pirsî:

- Em van bibine kîjan polîsyanê?

Ji dawiya dolmîşê polîsekî bi rih û rûtirş got:

- Bajo, em ê wan bibin polîsxana Fuarê.

Ji xwe tirsan hemû zarokan jî polîsxana Fuarê bû. Komsêrekî polîsxana Fuarê hebû, zarokan navê wî kiribûn "Xwediyê darê bê Xweda".

Berî ku wî li zarokan bixista, wî pêşî navê darê xwe ji wan dipirsî.

Yên ku navê darê wî nizanîbûna, wî deh dar zêde li wan dixistin.

122

Hesê dolmîş ji meydana Konakê derketin û du heban ji wan berê xwe dane Mezarlikbaşiyê û ya ku zarok tê de bû jî, berê xwe da polîsxana Fuarê. Piştî ku dolmîş ji meydana Konakê derket, polîsê ku li nik Bozan û Misto rûniştibû, bi guhên wan girt, serê wan li hev xistin û bi hêrs got:

- Hey bêjiyên heram, ma em ê hertim bi we dakevin? Ma hûn

nizandin ku cigarên biyanî qedexê ne? . . .

Polîsê şofêr peyva wî birî û ji zarokan pirsî:

- Hûn ji ku ne?

Herdiwan bi hev re bersiv dan:

- Em ji Mêrdînê ne.

Polîsê ku li dawiyê rûniştibû bi dengê bilind got:

- Yaho min fêhm nekir. Cigarefiroş ji Mêrdînê, qaçaxker ji Mêrdînê, meywefiroş ji Mêrdînê, mêrkuj ji Mêrdînê! Ev çi ye yaho? . . .

Polîsê ku li ba şofêr rûniştibû:

- Çima ew ê ne ji Mêrdînê bin? Ev li malê belaş digerin. Ev tu karekî weke mirovan nakin. Ev bêbav in, bêbav. . . Li paş xwe zivirî, serê herdu zarokan li hev xist, diranên xwe qiriçandin û got:

- Hey lawê keran bes e ji derdê we. Ma em ê heya kengî li dû we bin?

Polîsê şofêr piştî ku ji zivironekê zivirî ser rîya rast, got:

- Hûn ji kîjan siyaseta ne?

Bozan milên xwe hejandin:

- Yê min ez ne ji tu siyaseta me.

Misto jî eynî weke wî got:

- Yê min ez jî ne ji tu siyaseta me.

Polîsê ku li dawiyê rûniştibû, ji paşiyê de her yekê gurmistek li paş stûyê wan xist û got:

- Derewa mekin, hûn çawa ne ji tu siyaseta in?

Bozan:

- Weleh ez tu siyaseta miyasetan nas nakim.

Hema ku Bozan çi bigota, Misto jî ew digot. Ji ber ku Bozan bi

123

salekê ji Misto mezintir bû. Carna gava polîsan ji wan nuqurçk vedidan,

Misto xwe nedigirt û digiriya. Lê Bozan nedigiriya, tenê rûyê wî sor dibû û bêdeng dima.

Êdî mînubus ji polîsxana Fuarê derbas bû. Armanca polîsan ew bû, ku hin zarokên din jî bigirin û roja xwe bibine serî. Lê ji Bozan û Misto webû ku ew ê bêne berdan. Ji Bozan bêtir kêfa Misto dihat. Teva pakêtên ku di destên wî de hatibûn girtin, deh pakêt cigare çêdibûn. Lê her şeşên din di ber gorên wî de veşirtî bûn. Wisa kêfa Misto hat ku wî xwe negirt û spasên xwe ji wan re got:

- Pir spas! Weleh ez carake din cigaran nafiroşim; ez ê li çayxana apê xwe şagirtiyê bikim.

Polîsê ku li nik wî rûniştibû, yek li devê wî xist û got:

- Hiş be, bêjiyê haram! Tu ê îcar me bbcapînî ha! . .

Misto dîsan pozê xwe daliqand û kire îskînî.

Êdî dolmîşa wan gihîşte Tepecîkê û ajotin ber deriyê hewşa kerxanê.

Mirpv li wir ax biavêta li erdê nediket. Li ber deriyê hewşa kerxanê her tişt dihate firotin. Lê yên cigaretiros divabûn çarçavî bûna, tirsaw wan ji yên din bêtir bûn. Her kesî jî nikarîbûn li ber deriyê hewşa kerxanê cigare bifirota. Ji ber ku bîst û çar saetan li wir polîs peyda dibûn. Ji xwe li wir ji sê cigarefiroşan pê ve cigarefiroş tune bûn. Ger ne ji Çeto bûya kesî newêrîbû li wir cigare bifirota. Edî taxa Tepecîk ketibû destên Çeto. Bi kurtayî Çeto li wê taxê bûbû serokê cigarefiroşan. Çeto jî berê mîna Bozan û Misto li Konakê cigare difrot. Piştî ku wî û serokê cigarefiroşê Konakê li hev nekirin, êdî serokê cigarefiroşan nehişt, ku ew li wir cigaran bifiroşe.

Wî jî êdî hew li wir cigare firot. Ew pêşî çû nik cigarefiroşê Bornovayê.

Lê li wir jî li hev nekirin. Dû re ew çû nik yê Alsancakê. Piştî ku li wir jî li hev nekirin, êdî ew çû taxa Tepecîkê û ji xwe re çend cigarefiroş jî peyda kirin û bû serokê cigarefiroşan. Ew tax, bû taxa

wî. Ji hemû serokên cigarefiroşan bêtir jî ew dihate nas kirin. Dost û hevalên wî ji yê hemûyan bêtir hebûn. Hema hema polîsên sê polîsxanan ew nas dikirin. Tenê peywendiyên wî bi polîsên Fuarê 124

re tunebûn. Gava peywendiyên wî bi polîsên Fuarê re jî çêbibûya, tirs a wî nedima. Polîsên din ku dihatin, digotin:

-Çeto!

Çeto jî digot:

- Temam, tamam! Me fêhm kir!

Bi dizî pakêtek cigare dixiste bêrîka wan û ew ji ser xwe der dikirin. Carna jî wî destê xwe dikire hutik, li zikê wan dixist û digot:

- Hûn wek gurên birçî ne!

Ji xwe hemû cigarefiroşan navê polîsan kiribûn "gurên birçî".

Gava polîs ji dolmîşê daketin, Çeto fîkand û ji hevalên xwe re got:

- Xwe bidin alî, gurên birçî hatin!. . .

Şika mirov tew ji Çeto çênedibû. Ew tu caran jî nehatibû girtin.

Tenê carekê ew kirî bihata girtin, lê ew jî sêcê hevalê wî bû.

Çeto dîsan fîkand, lê hevalê wî li wî hayî nebû, her bang dikir:

- Marlboro!. . . Keeent!. . .Marlboro!. . .

Polîsek ji wan çû, bi qestî cuzdanê xwe derxist û bazara cigaran kir:

- Kent bi çiqasî ye?

- Libawan bi sê lîran e, tu li Konakê bi pêncî bi dest naxînî.

Polîs xwe hê bêtir li nezaniyê danî:

- Na, ez ê bîst û pênc lîran bidime te. Ez nikanim cigareyên din bikişînim. De, bi bîst û pêncan bide min.

- Na, apo, çê nabe! Ji te tirê ku ev Samsûn e?

Polîs du lîra û nivê din jî lê zêde kir:

- Niha tu bi bîst û heft û nîvan jî nadî?

- Bîst û heft û nîv kirîna wan e, apo. Em serê pakêtê du lîra û nîvan kar dikin. Çavê te lê ye ku em bê qezenc bidin te û li vir li ser lîngan birikrin. Ji xwe tîrsa polîsan jî ne tê de.

Çeto li hemberî wî rawestiyabû û jê re bi destan îşaret dikir. Lê, lêwîk qet li dora xwe nedinihêrî, wî her bazara cigarê dikir.

Polîs dîsan got:

125

- Birazî, bi bîst û heft û nîvan bide min, ne hewce ye ku ez ewareyî Bornovayê bibim. Li Bornovayê liba pakêta kent bi bîst û pênc lîran e.

Lêwîk berê xwe jê guhert û got:

- Baş e, apo, here ji xwe re ji wir bikire.

Heta ku ji polîs hat, şîmaçek lê xist û got:

- Bide pêşiya min, bêjiyê heram!. . .

Hingî lêwîk fêhm kir ku ew polîs e. Wî pêşî xwest bazde, lê kir û nekir firsend neketiyê.

Çeto hêdî di ber wan re çû, dada pakêtên di destên lêwîk de û baz da. Polîs bera dû wî da. Lê ne bi tenê polîsek, ger deh polîsan bi hev re bera dû Çeto bidana jî, wan nikarîbûn ew bigirtana. Gava polîs bera dû Çeto da, lêwîk kuçe li xwe zîvirand û wînda bû.

Ji xwe ji bo girtina zarokan sê polîs daketibûn. Piştî demeke kurt, hersê jî destvala ber bi dolmîşê ve vegeyriyan. Gava ew ketin dolmîşê, yekî ji wan destê xwe li ser çavên Bozan û Misto xist û got:

- Hûn ê bazdin jî ha!. . Hûn ê me bixapînin. . .

Wan dolmîşa xwe ajotin, ew kirî bigihîştina Basmanê, dîsan ji bo berdana xwe Misto li ber wan geriya:

Polîsê ku li paş wî rûniştibû, bi qemçika paş stûyê wî girt, ew bi hêz hejand û got:

- Em ê te berdin ha! . . . Bêjiyê bêjî! . . .

Polîsê ku li pişt wî rûniştibû, sîleha di destê xwe de nîşanî wî da got:

- Ger hûn navê vê sîlaha di destê min de bizanibin, em ê we berdin.

Bozan û Misto bi hev re lê nihêrîn. Gelo wê navê wê çi bûya?

Wer ku li welêt qala tivingên Alman dibû, ji Misto webû ku ew tivinga Alman e, lê Bozan pê keniya û got:

- Ma ev ji ku tivinga Almanî ye, malwêran! G:3 e.

Hingî hemû polîsan li çavên hevdu nihêrîn. Yekî ji wan dîsan jê pirsî:

126

- Te got navê wê çi ye? . . .

Bozan milên xwe hejandin:

- Ez baş nizanim, lê ez texmîn dikim, ku ev G:3 e. Polîsê ku li herî dawiyê rûniştibû, bi dengekî gur got:

- Min ji we re negot ku ev bi her tiştî dizanin. Ev kurd in. Gava mirov bibêje "kurd" divê mirov pênc deqîqan bihizire. . .

Yê şofêr peyva wî domand:

- Wldi rast e, her tişt ji van tê; ji mêrkujiyê bigire, heya bi qaçaxkeriyê.

Edî ew gihîştin ber deriyê polîsxaanê, wan dol-mîşa xwe sekinandin, her du heban bi milê yekî girtin û ji dolmîşê daketin.

Gava li polîsxaanê polîsan xwestin ku li ser wan bigerin, ji tirsê çokên Misto lerizîn, wî xwe negirt û giriya. Çaxa polîs li wan geriyan, şeş pakêt cigarên din jî di ber gorên Misto de dîtin. Di gerdîstîna pakêtên ku di destên wî de hatibûn girtin, tam deh pakêt cigare çêdibûn.

Piştî ku polîs her yekî deh dar li destên wan xistin, paşê ew avêtin

nezaretxanê. Misto ji Bozan bêtir digiriya. Gava ew bi serê xwe di nezaretxanê de man, Bozan şîret li Misto kir û ew da rawestandin. Dû re wan destên xwe nîşanî hevdu dan. Kefên destên herdiwan jî reş û şîn bûbûn. Dîsan ji Bozan bêtir janê dida dilê Misto. Misto nikanîbû li ser lingan rawestiya, ew daqûl bû û li ser tûtika rûnişt. Paşê wî herdu destên xwe dane ser hev, xistin nava çokên xwe û guvaştin. Wî fikir nedikir tebatî nediketiyê, wisan janê dida dilê wî ku ew nikanîbû di cihê xwe de rawestiya. Piştî ku hebekî jana dilê wî temirî, ew rabû ser xwe, eynî weke girtiyên girtîgehan du-sê caran di hundurê nezaretê de çû û hat. Dû re devê xwe xiste guhê Bozan û got:

- Tu bi a min bikî em ê baz bidin.

Bozan destê xwe li sînga wî xist:

- De here kuro! Em ê çawa ji destên van polîsan baz bidin? Ma te navê komsêrê Fuarê nebihîstiye, bê ew çi bêbav e?

- Ez di bêbaviya wî nim. Ew bêbav be, ez ji wî bêbavtir im, ox-
127

lum!

Bozan xwe avête sînga wî, ziq li çavên wî nihêrî û got:

Devê xwe temîz bigire, careke din nebêje "oxlum".

Misto destê Bozan ji sînga xwe daxist û got:

Binêre, Wdleh ez rast dibêjim, ger tu bi a min bikî em ê baz bidin.

Bozan serê xwe kil kir:

Zor e, zor. . .

Çi zor e loo... Apê min panzdeh sal ceze lê hatibû birîn, baz da; yê te tu dibêjî zor e.

Bozan destê xwe danî ser devê wî û bi pistînî got:

Hiş be lawo, qala tiştên wisa meke, dibe ku mîkrofon li van deran

hebe; wê dengên me bê girtin, hingî em ê di girtîgehan de birizin.

Misto destê xwe ber bi wî ve hejand:

Here lo, tu biziya. Çi mîkrofon û çî hal. Ma mîkrofon hebe ew

ê di ku de be, ma ne tenê ev hundur e?

Belê, tenê ev hundur e, lê ew dikanin cihê mîkrofonê di dîwêr de jî çêbikin.

Êdî hêdî hêdî tarî dikete erdê. Her ku derve tarî dibû, hundurê nezaretxanê tarîtir dibû. Bozan û Misto êdî di hundur de aciz bûbûn.

Dev ji acizbûnê berde, ji birçîna ew nikanîbû li ser xwe rawestiyana.

Ji xwe nezaretxane tenê cihê sê peyan tê de hebû. Lê di

hundur de tu tişt tunebû. Textikek jî tunebû ku wan xwe bidana

ser. Ew li ser çimento bûbûne weke du daran. Her ku dereng dibû,

hundurê nezaretxanê bêtir dicemidî. Baş bû, ku çakêtê Misto lê bû.

An na ew ê ji serma biqefiliya. Bozan jî tim solên xwe dixistin bin

serê xwe û xwe li ser çimento dirêj dikir. Misto çend caran ji bo ku

here daşirê li derî xistibû, lê polîs pê re xeyidî bûn û derî li wî venekiribûn.

Misto hew xwe girt, bi lez bişkokên pantorê xwe vekirin û di

quncikeke nezareocanê de mîst. Gava xwişîna mîza wî hat, Bozan ji

128

cihê xwe pekiya û bi ser de qîriya:

- Lawo, lawo! Ma tu çî dikî? Em ê ji bêhna mîza te çawa di vir de razên îşev?

Misto fedî kir, tu bersiv neda.

Dengên ken û henekên polîsan di polîsyanê de olan didan. Wilo

xuya bû ku êdî dora polîsan dihate guhertin. Ji berdêla polîsên rojê,

polîsên şevê dihatin. Di wê navê de, yek ji polîsên ku nû hatibû, çû

ber deriyê nezaretê û ji wan pirsî:

- Sûcê we çî ye, kuro?

- Cigare bi me re hatine girtin.

Polîs destê xwe di nava şîşên derî re dirêjî serê herdiwan kir, serê wan li hev xist, diranên xwe qiriçandin û got:

- Cigare bi we re hatine girtin, ha?. . . Tew cigareyên biyanî!. . .

Piştî ku ew polîs çû, yekî din hat; çar pênc nifte di destê wî de bûn û hate ber derî. Berî ku ew bipirse, Bozan got:

- Sûcê me cigarefirotin e.

Ji ber ku zêdeyî deh polîsan ji wan pirsî bûn. Gava wan digotin.

"Sûcê me cigarefirotin e" polîs bi ser wan de radibûn, xeber û gotinên pîs ji wan re dikirin. Carinan jî bi guhên wan digirtin û serê wan li hev dixistin.

Misto jî rabû:

- Sûcê me cigarefirotin e.

Polîs bi dilşewatî serê xwe hejand û got:

- Ez dizanim, ez dizanim. . .

Pasê wî j i wan pirsî:

- Ma hûn dbcwazin herin dasirê?

Herdiwan bi hev re gotin:

- Erê, em dixwazin.

Polîs ji wan re derî vekir û herdiwan bi hev re baz dan daşirê. Piştî ku ew ji daşirê veşeriyar, polîs ji wan pirsî:

- Hûn ne birçî ne? Ma we tu xwarin xwariye?

Dîsan herdiwan bi hev re gotin:

129

Em birçî ne, me tu xwarin nexwariye.

Polîs bi perê wan çû ji wan re nanek û hin xiyar û firingî kirî û anî da wan.

Herdiwan mîna gurên birçî nan ji destên hevdu revandin. Piştî

ku wan zîkê xwe têr kirin, polîs dîsan ji wan re derî vekir. Wan çûn
têr av vexwarin, dest û ser çavên xwe şuştin û vegeriyan cihê xwe.

Piştî ku polîs derî li ser wan girt, ji wan pirsî:

Min nepirsî, gelo hûn ji ku ne?

Em ji Mêrdînê ne, zarokan gotin.

Polîs jî xwe bi wan da naskirin:

Ez jî ji Wanê me.

Paşê polîs ji wan pirsî:

Dê û bavê we li vir in an na?

Bozan:

-Na!

Lê hûn çawa û ji bo çi hatine vir?

Dîsan Bozan bersiv da:

Apê min li vir çayxaneyeyeke wî heye. Gava ew hatibû welêt, ew
hate mala me û ji bavê min re got: " Çi ye ev zarok bê kar di ser
hevdu de genî bûne? Wan bişîne ba min, bi firotina avê mabe, ew ê
we xwedî bikin". Bavê min jî rabû ez şandim. Lê bêê dilê diya min
bû. Diya min kir nekir, çiqas li ber bavê min geriya negeriya, bavê
min bi a wê nekir û ez şandim. Giriyê ku diya min li dû min kir ez
tu caran ji bîr nakim. Di destpêkê de min pir dixwest ku ez werime
îzmîrê. Lê ez niha poşman bûme. Xwezî min bi a diya xwe bikira û
eznehatama....

Îcar polîs ji Misto pirsî:

Dê û bavê te jî li welêt in an li vir in?

Bavê min tune ye, lê diya min li vir e. Piştî ku bavê min hate
kuştin, xalê min mala me ji gund bar kir ba xwe.

Polîs bi şaşmayî jê pirsî:

Bavê te hatiye kuştin?. . .

130

- Erê, bavê min hatiye kuştin. Bavê min barkêşiya qaçaxkeran dikir. Ew di nava tixûb de hate kuştin. . .

Polîs hilma dawî li cigara xwe xist û avêt:

- Berî ku komsêr were divê em awayekî bikin. Ger komsêr were xelasiya we tune, hûn ji destên wî nafilitin. Piştî saeteke din ew li ku be ew ê were.

Berî hatina komsêr, bi alîkariya polîsê Wanî, Bozan û Misto di pencereya daşirê de xwe avêtin jêr, bi tirs û bi heyecan ji polîsyanê bi dûr ketin û tevî qerebalixa mirovan bûn.

131

SERÎHILDANA ZAROKAN

I

Bavê Gurî li deriyê sinifê xist û bi Gurî re kete hundur. Kincên bavê Gurî bi zarokên dibistanê hebekî ecêb hat. Şelwerê wî û kumê li serî hemû zarok dane kenandin. Lê mamoste ew dane rawestandî û ji bavê Gurî pirsî:

Te navê wî li ba Midûr nivîsand?

Bavê Gurî destên xwe dane ser hev, serê xwe tewand û got:

-Erê.

Wî Gurî emanetî mamostê kir û derket.

Piştî ku mamostê Gurî bi cih kir, wê ew bi zarokan da naskirin:

Navê vî hevalê we Gurî ye. Gûrî nû hatiye bajêr. Ew jî weke we

tenê sê salan çû ye dibistanê. De, hûn jî xwe bi Gurî bidine nas kirin.

Pêşî Şêro xwe bi Gurî da naskirin, lê ji ber ku ew pir kenîya, mamoste nehişt ew bipeyive û ew dîsan da rûniştin. Dû re Biro rabû,

hebekî bi şermokî xwe bi Gurî da naskirin. Di wê navberê de Beko

destê xwe bilind kir û xwest bipeyive. Mamoste darê xwe ber bi wî

ve dirêj kir:

Bibêje!

Beko bi dengê bilind kenîya û got:

Bi rastî jî navê wî hevalî xweş e.

Mamoste pê re xeyidî, erza wî şikand û got:

Ez careke din nebînim. Ev çi qeşmeriye te pê girtiye?

Lê, Beko dîsan rabû ser xwe û peyivî:

Bi rastî jî navê wî xweş e! . . .

Kêfa Gurî ji wan peyvên Beko re hat. Ji wî webû ku Beko bi rastî

dibêje. Wî nizanîbû ku Beko henekê xwe bi navê wî dike.

132

Beko dîsan xwest tiştê bibêje, lê mamostê peyva wî birî û nehişt bêt ku ew destê xwe bilind bike, ew bipeyive. Beko guh neda wê û peyva xwe domand:

- Mamoste, ma tu dizanî mana gurîtiyê çi ye?

Mamoste hêrs bû. Çû ba wî, bi guhê wî girt û got:

- Kuro, ma ev çend car in, ez ji te re dibêjim, zêde nepeyive?

Ha? Ma qey peyv nakeve serê te? Gava mamostê guhê wî berda û ber bi textê nivîsandinê çû, Beko ji paşiyê de henekê xwe bi wê kir, zimanê xwe derxist û çavên xwe şaşo maşo kirin.

Îcar Ken destê xwe bilind kir, destûra peyvê ji mamostê xwest û xwe bi Gurî da naskirin. Dû re Nûjîn, Mizgîn, Bozo, Azad... Hemû zarokên di sinifê de xwe yek bi yek bi Gurî dane naskirin.

Pênc deqîqe mabû ku zengilê navbirê lêbiketa. Berî ku zengil lê bikeve, mamostê şîret li zarokan kir û Gurî emanetî wan kir.

Dîno:

- Mamoste, ez ê bi Gurî re bibime heval.

Beko destê xwe li destê wî xist û bi hêrs got:

- Ew di rex min de rûdinê, ez ê bi wî re hevaltiyê bikim.

Tiştên ku Beko gotin, neketin serê Dîno. îcar ew çi ye? "Ew di rex min de rûdinê, ez ê bi wî re hevaltiyê bikim." Ger wilo be, hema her kes wê bi yê di rex xwe de hevaltiyê bike. Dû re Dîno Beko dehfa û got:

- Heydê, biqêsite!

Beko bi destê wî girt, ba da û got:

- Ancax yê mîna te biqêsitin ûlan!

Mamoste bi ser herduyan de qîriya:

- Zû werin vir!

Dîno:

- Sûcê min tune ye mamoste, ma tu wî nabînî?

Mamoste dîsan qîriya:

- Min ji we re got, werin vir!

Dîno wisa serê xwe li Beko hejand, ku di awirên wî de mirov di-
133

got qey dibêje "ez ê li derve nîşanî te bidim".

Mamostê bi destên herduyan girt, li ber wan, li ser tûtikan rûnişt
û bi dengê nizim ji wan re got:

- Binêrin, lawê min, divê hûn biazil bin, hûn ji hevdu hez bikin
û bi hev re bileyizin. Divê hûn ji Gurî re bibin mînak. Ma ku hûn
li hevdu wilo bikin, li hevdu xin, dê Gurî nebêje çi? Ma ew ê henekê
xwe bi me neke?

Herdu zarokan jî bi mana "erê" serê xwe hejandin.

Dû re mamostê destê xwe di serê herduyan da û ew şandin cihên
wan.

Gurî di cihê xwe de şaş mabû. Ew ecêbmayî mabû ku çawan jinek
evqas tişt bizanibe û bizanibe evqas şîretan li mirovan bike.

Gurî di xeyalan de kûr çû û di dilê xwe de got:

- No! Ez careke din nayême vê dibistanê! Dibistana ku jinek mamoste be û weke peyan darê xwe bihejîne, bi guhê mirovan bigire, bi ser mirovan de biqîre û şîretan bike, ez naçime wê dibistanê. Ma ez sibehê herime gund, dê gundiyên min ji min nepirsin bê mamostê min kî bû? Ez li gund mamostê hemû jinan bûm û min ew hînî xwendin û nivîsandinê dikirin. Ger ew jinên gund bibihîzin ku li bajêr jinek mamostê min e, ma ew ê ji min re nebêjin çî? No, Wdleh ez hew tême vê dibistanê!

Hîn wilo, li zengil ket. Bi dengê zirîna zengil, Gurî ji cihê xwe pekiya û ew tiştên ku lê difikirî hemû ji bîrê çûn. Ew rabû ser xwe, deftera xwe danî ser pirtûkê, pênûs danî ser defterê û bi zarokan re derket derve.

Li derve Gurî şaş bû, devê wî ji hev ma. Wî tu caran ewqas zarok bi carekê ve nedîtibû. Piştî ku ew çend gavan ber bi hewşa dibistanê ve çû, bavo, ew çî bibîne; dît li hewşa dibistanê zarok weke axê ne. Gurî tu caran nedifikirî û aqil nedikir dê ewqas zarok li dibistanekê hebin. Ew di wê deqîqê de li gund û li dibistana gund fikirî. Bi tenê çardeh panzdeh şagirtên dibistana gund hebûn û hewşa dibistanê bê deng û sakîn bû.

134

Di wê navberê de du zarokan tiliyên xwe ber bi wî ve dirêj kirin û kenyan. Kêfa Gurî qet ji wan û ji kenê wan re nehat. Gurî bi hêrs ber bi wan herdu zarokan ve çû. Yekî ji wan zarokan nuqurçk ji hevalê xwe veda, tiliya xwe ber bi pantorê Gurî ve dirêj kir û got:

- Hê hê! Li pînê pantorê wî binêre! Li pînê pantorê wî binêre!

Gotinên wî lawikê Gurî pir êşand, dilê wî bi wî şewitand.

Wî ji bavê xwe re gotibû: " Ez bi vî pantorê pînekirî naçime dibistanê."

Bavê wî destê xwe di serê wî dabû, li ber wî geriyabû û gotibû:
"Lawê min, tu niha bi vî pantorî îdare bike, bi xêr ez ê ji lawê
xwe re pantorekî nû û xweşik bikirim." Lê, bavê wî jê re tu kinc nekirî
bû. Dibû ku perên bavê wî tune bû ku jê re kincan bikire. Ji
xwe ger perên bavê wî hebûya, hîn berî ku Gurî bigota "bavo ji min
re kincan bikire", dê bavê wî jê re bikiriya. Lê nekirî bû, ma dê Gurî
çi bikira? Gurî dîsan îdare nekir, fikirî û di dilê xwe de got:

- Ger bavê min ji min re kinc bikiriya, wê van zarokan negotina
"hê, hê, li pînê pantorê wî binêrin."

Lê, wan herdu zarokan dev ji Gurî bernedan. Geh hutik lê xistin,
geh jî tilî avêtinê. Carna jî digotin:

- Li pînê pantorê wî binihêrin, li pînê pantorê wî binihêrin û dikenyan.
Ji hêrsan girî kete qirika Gurî. Paşê wî herdu destên xwe
kirin gurmist û êrîş bire ser wan herdu zarokan. Gava wî çend gurmist
avêtin yekî, yê din ji tirsê baz da.

Dîsan li zengil ket. Zarokên ku li hewşa dibistanê dileyistin, hemûyan
lîstikên xwe nîvcî hiştin û bi çindikavêtinê bazdane sinifên
xwe.

Bi rastî vî zengilî jî serê Gurî li hev dixist, lê wî zêde guh nedayê.
Li gund tu zengil mengilên wilo tunebûn. Tenê mamoste derdiket
ber deriyê dibistanê û li pîpîkê dixist. Carna jî wî tenê di pacê de
bangî şagirtan dikir. Ji xwe bi tenê çardeh panzdeh şagirtên dibistana
gund hebû û bi gotina Gurî ew jî ne weke van şagirtên bajariyan
zimandirêj û qure bûn. Hema ku mamoste li pîpîkê bixista, an di
pencerê de bangî wan bikira, hemûyan dev ji lîstikên xwe berdidan
135

û direviyan hundurê sinifê.

Gava Gurî kete hundurê sinifê, hê tu zarok neketibûn hundur.

Wê yeka han kêfa mamosta anî. Ew ji ser masa xwe rabû, destê xwe di serê wî da û got:

- Aferîn, lawê min. Tu her tim wilo di wextê de were, erê?

Gurî bi şermokî di mana "erê" de serê xwe ber bi jêr ve hejand û çû li cihê xwe rûnişt. Piştî ku ew li cihê xwe rûnişt, hin zarokên din jî ketine hundur. Lê, bi tenê Beko û Dîno nehatin. Mamosta axînek kûr kişand û got:

- Ev her dem wilo dereng dikevin dersên xwe. Nizanim gelo ji bo ku ev baş bibin û guh bidine dersên xwe ez çî bikim? Ger ew li vir bûna me ê niha dest bi dersa xwe ya jîmnastîkê bikira.

Hîn mamoste wilo dipeyvî, dît ku herduyan hevdu dehf dan û ketin hundur. Şêro bi dengê bilind got:

- Mamoste, va ye Beko û Dîno hatin!

- Erê erê, ez dibînim, mamostê got.

Dû re wê berê xwe bi Beko û Dîno ve kir:

- Ev çend car in, ez ji we re dibêjim di wextê xwe de werin? Ma ji we weye ev mala bavê we ye? . . .

Beko wa bi serîhildanî bersiva mamostê da:

- Çima tu wisa dibêjî mamoste? Here van peyvan ji Midûr re bike.

Wî ji bo kirîna pakêteke cigare ez şandibûm dikanê.

Dû re mamoste berê xwe bi Dîno ve kir û bi sertî jê pirsî:

-Lêtu?

- Midûr ez jî bi Beko re şandibûm.

Mamostê berê xwe bi hemû zarokan ve kir û ji wan re got:

- Ji niha û pê ve ne Midûr, ger sermidûr jî we di dema dersê de bişîne cihekî neçin. Ger ew ji we re bêjin: "Çima?" Hûn bêjin:

"Mamosta me ji me re gotiye." Erê, we fêhm kir?

Hemû zarokan mîna ku bi dengê bersiv dan:

-Erê!

Di wê navberê de dengê bi îskîn hate guhên mamostê. Mamos-

136

tê berê xwe bi Nûjîn ve kir û pirsî:

- Çi ye keça min, ji bo çi tu digirî?

Keçikê hê bêtir kire îskînê û bi dengê bilind giriya. Ji girî bi zorê peyv jidevderket:

- Beko bi qelema xwe li ser kitêba min ya matematîkê xet kişandin.

Mamoste ji hêsan hew dikanîbû di cihê xwe de rûništa. Ew rabû ser xwe, ber bi Beko ve meşiya û bi ser de qîriya:

- Kuro ma qey peyv nakeve serê te? Ev çend car in ku ez ji te re dibêjim li dibistanê tiştên wisa meke? Ez ê îşev hemûyî ji dê û bavê te re bibêjim. Dû re wê bi guhê wî girt û ji bo ku ew du deqîqan li qorziyekê li ser lingekê raweste, ceze dayê. Paşê mamoste çû, li cihê xwe rûnişt û ji zarokan re got:

- Îcar hebekê bêdeng bin, li min guhdarî bikin. Niha dersa me ya jîmnastîkê ye. Wê mamoste Elî were dersa me ya jîmnastîkê. Divê hûn li hemberî wî bêdeng û bîaqil bin, da ew kêfa xwe ji we re bîne û bibêje: " Aferîn, zarok divê wisa bin." Bila ew bizanibe ku di vê dibistanê de yê herî zîrek û zane hûn in.

Ji bilî Beko hemû zarokan bi dengê bilind gotin:

-Erêê!...

Mamostê ji Beko pirsî:

- Çima, ji bo çi deng ji te dernakeve?

- Ez ji dersa wî Eliyê şîşko hez nakim.

- Ji bo çi tu ji dersa wî hez nakî?

- Ji ber ku gava ew baz dide, qûna wî bi metreyekê ji laşê wî bi dûr dimîne. Ji ber vê yekê ez jê hez nakim.

Bi wan gotinên Beko hemû zarok kenyan. Lê mamostê hew hişt ku Beko bipeyive û ji bo ku ew qesmeriyên wilo neke, wê şîret lê kirin.

Beko bi pênuşa xwe li ser neynûka xwe ya tiliya girdikê tiştin nivîsandin û di cihê xwe de bêdeng ma.

Pir tê de neçû mamoste Elî kete hundur. Wî çakêtê di destê xwe J37

de bi dar de kir û hebekî kravata xwe sist kir. Piştî ku ew piçekî bi mamostê re peyivî, ew li zarokan zîvirî û bi devkenî jê pirsî:

- Kincên we hemûyan yê jîmnastîkê hene?

Gurî destê xwe bilind kir, destûra peyvê xwest û peyivî:

- No, kincên min yê jîmnastîkê tunene.

Mamosta wa bi şaşmayî lê nihêrî û ji mamosta Hêlîn pirsî:

- Xuyaye ev kêroşkekî nû ye?

Ev peyva mamoste Elî kete serê Beko. Beko kenya û got:

- Bi rastî jî ev nav tam lê tê. Eynî wekî kêroşka ye.

Gurî ji qehran serê xwe danî ser masê û kire îskîn. Ew çî bû îcarê?

Du nav ne bes bûn îcar sê navên wî çê dibûn. Ma qey wan nizanîbûn

ku Gurî ne navê wî yê rastî ye? îcar wan navê "Kîvroşk" jî lê

kirin. Niha ew dibû sê navî. Çepo, Gurî û Kîvroşk. . . Navê wî yê

rastî Çepo bû. Lê, biçûkî, gava hinek pizik di serê wî de derketibûn

û wer ku ew ji ber êşa pizikan giriyabû, bavê wî hêrs bûbû û bi ser

de qîriyabû: "Hela bes e, Gurî, te em ji guhan kirin lawo. Ma te xêr

e?

Edî ew nav di nava zarokên gund de bdav dibe. Herkes navê wî

yê rastî "Çepo" ji bîr dikin û jê re dibêjin "Gurî"

Gurî serê xwe ji ser masê rakir û bi îskîn ji mamoste Elî re got:

- Ku ez kêroşk bim, tu jî şîşko yî. Lê ji ber ku mamosta Elî bi mamosteya

wan re dipeyvî, deng neçûyê.

Piştî ku mamosta Elî bi mamosta Hêlîn re peyvî, wî hemû zarok dane ber xwe û ew birin sinifa xwe.

Dersa wan ya jîmnastîkê pir xweş derbas bû. Jîmnastîka wan qet ne weke ya gund bû. Ji xwe tiştê ku kêfa Gurî jê re hat jî ew bû. Dersên jîmnastîkê li gund qet ne wilo bûn. Wan tenê du-sê caran li dora dibistanê baz didan û carina jî tenê di sinifê de xwe çend caran vedizelandin. Lê li vir, bi muzîkê û bi pir tiştên tewlo mewlo dersên jîmnastîkê dikirin.

Piştî dersa jîmnastîkê hemû zarokan çentê xwe girtin û berên xwe dane malê.

138

II

Gurî wê êvarê heya bi dereng nehişt dê û bavê wî bîskê rûnên û bêhna xwe berdin. Hemû tiştên ku li dibistanê bûbûn, hemû tiştên di serê wî re derbas bûbûn, rewşa zarokan, rewşa dibistanê, rewşa mamostan; hema wî çî kiribû û çî dîtibû ji dê û bavê xwe re gotin. Bavê wî rabû ku nimêja eşa bike, lê, Gurî nehişt, ew dîsan da rûniştin û dîsan her tişt ji serî heta binî jê re got. Gava ew herdu zarokên li dibistanê, yên ku henekê xwe bi kincên wî kiribûn hate bîra wî, çavên wî tijî hêsir bûn û bi dengê nîvqurmiçî ji bavê xwe re got: Welleh tu ji min re pantorekî nekirî ez ne diherim dibistanê, ne jî diherim ber mdê. Min ji te re gotibû, ez bi vî pantorê pînekirî naçime dibistanê, te gotibû, tişt nabe lawê min, bajar ne weke gundan in, kes karê xwe ji kesî naynin û henekê xwe bi kesî nakin.

Welleh tu ji min re pantorekî nû nekirî ez ne diherim dibistanê ne jî diherim ba melê. Ez zanim, ew zarokên dibistanê dê hemû bi min bikenin û dev biavêjin pînê pantorê min. Ez dizanim ku ew

herdu pînc dev ji min bernadin.

Bavê wî cigara qalind, ya ku pêçabû, xiste devê xwe û bi heste vêxist.

Ji ber ku serê cigara wî baş tijî tûtin nebûbû, tenê pd şewitî û cigare vêneket. Wî dîsan heste vêxist û da serê cigarê. Dixana pêşî di dev û pozê xwe re berda û tûtina ku ketibû devê wî, bi hilma dudan re, bi nermî tif kir. Paşê wî destê xwe avêt ser stûyê Gurî, ew ber bi xwe ve kişand û bi bergerîn jê re got:

Lawê min, Welleh ez ê ji te re pantorekî bikirim. Ne min berê ji te re soz daye, ku ez ê ji te re pantorekî bikirim. Lê tu hebekî xwe ragire, heta ku ez meaşê xwe bistînim.

Gurî wextî dîsan bigiriya û bigota: "Na Welleh tu ji min re nakirî", lê wî bi toreya bavê xwe dizanîbû. Wî dizanîbû ku ew careke bigirî û pantor bixwaze, dê bavê wî erza wî bişikîne û tu pantoran jê re nekire.

Gurî deng nekir, weke pisîkeke ku mirov pişt guhan mist bide, di 139

hemêza bavê xwe de bêdeng ma. Gurî deh salî bû, lê wî xwe di wê deqîqê de sê-çar salî hîs dikir. Wî wisan dilê xwe bi xwe dişewitand, ku carinan xwe nedigirt û hêsir ji çavên wî diherikîn.

Bavê wî destê xwe di serê wî da û got:

- Bi xêr ku îsal lawê min dibistana xwe xelas bike, ez ê jê re qatek kincên xweşik û spehî bikirim. Ez ê qatek kincên xweşik, ji qumaşê îngilîz ji lawê xwe re bidime dirûtin.

Lê ji ber bêxewbûnê êdî hewesa Gurî zêde li ser peyvê nema. Xewê, xwe mîna kabûsekî berdida ser wî. Ew çend caran li ser hev bawîşkî û çavên wî hatin girtin. Bavê wî hêdî, bêh ku wî şiyar bike, serê wî danî ser çoka xwe. Dû re wî bi dengekî nizim bang diya wî kin

- Keçê, hda tu were vî lawikî bibe nava cihê wî.
- Piştî ku jinikê nivînê wî li erdê raxist, hat û Gurî bir xiste nava nivînê wî. Dû re wê nivînê xwe û yê mêrê xwe jî li erdê raxistin û bang mêrê xwe kin
- Ma çavên te lê ye tu li wir razê, lo? Tu jî nayê nakevî nava nivînêxwe? Mêrik axînek bi derd kişand û ji cihê xwe rabû. Piştî ku çû daşirê mîst, hat, kincên xwe ji xwe kir û kete nava cihê xwe. Jinik bîskê bêdeng ma, paşê got:
- Wer xuyaye zarokan dev avêtine pînê pantorê Gurîkê min.
- ErêWdle...
- Wldi ev zarokên bajaran jî pîç in, ji ên gundan xerabtir in.
- Ma tu tuxûb di navbera zaroktiyê de heye? Zarok li her derê zarok in.
- Çi? Welleh dema me qet ne wilo bû. Hin zarok hebûn xwas bûn, bi kincên pertal pertalî jî digeriyên dîsan kesî ne dev diavêtin wan ne jî ew dibehelandin.
- Mêrik nexwest zêde li ser kincan bipeyive, peyva xwe guhert:
- Bila Gurî ji xwe re bîxwîne, bibe tiştêk. Yê me hey me nexwend, em wilo nezan û bê senhet man. îro her tişt di xwendinê de
- 140
- ye. Xwendin ji mal û peran jî bi qîmettir e. Ma ne wisa ye lê? Ma li gund qîmeta lawê Cindî bi çiqasî ji ya lawê axê bêtir bû? Ger lawê Cindî ne xwende bûya, ew ne doktor bûya, ma dê kîjanî ji me gundiyan bêtir qîmet bidaya wî? Ma dê lawê axê ne di ser me hemûvan re bûya?
- Erê Wele! Xatirê lawê Cindî bi deh qatan ji xatirê lawê axê bêtir e. Bi rastî jî lawê axê ne hêja ye neynûka lawê Cindî. Ferqa di navbera wan de mîna çiyên e. Neynûka lawê Cindî bi lawê axê ye.

Lê, ji bo vê yekê ez ê Gurîko bidime xwendin. Heta jê tê bila bixwîne. Dibe ku xelk ji bo wî xatirê me jî bigirin.

Jin û mêr bi wî awayî heta dereng li ser lêwik û rewşa lêwik peyivîn. Herdu bi wî awayî di xew re çûn. Wan di xewnên xwe de jî her lawik dîtîn.

III

Sibehê zû, piştî ku Gurî taştiya xwe xwar, wî rahişt çentê xwe, diya xwe hemêz kir û ber bi dibistanê ve lezand. Ew bi rê de qet nesekinî, rast çû ber deriyê sinifê û li derî xist. Lê tu deng ji hundur nehat. Gurî çend carên din jî li derî xist. Gava dîsan wî tu deng ji hundur nebihîst, wî hêdî derî vekir û kete hundur. Hîn tu zarok neketibûn hundur, hundur vikîvala bû. Gurî kirî bi paş de vegeriya, lê gava ew çav li çentê li ser masê ket, ew venegeriya. Ew ber bi çente çû û destê xwe xiste hundurê wî. Gava wî wilo çente peland, ew tê-gihîşt ku çentê mamosteya wî ye. Piştî ku bi tirs li dora xwe nihêrî, zîncîra çente kişand û çente vekir. Hema wî zûka herdu destên xwe xistin hundurê çente û destên xwe li hundurê çente gerandin. Piştî ku wî baş hundurê çente li hev xist, tiştêkî mîna pênuşekê kete destê wî. Ew tiştê mîna pênuşê boyaxa lêvan ya mamosteya wî bû; lê ji Gurî webû ku ew pênuş e. Gava wî di kaxeza ser masê da, sor nivîsand. Gurî ew xiste bêrîka xwe, çente weke berê kir û derket derve.

141

Êdî hewşa dibistanê ji zarokan tijî bûbû. Gurî li dora xwe nihêrî û çavên xwe li hevalên xwe yên sinifê gerandin. Wî zû hevalên xwe dît û ber bi wan ve baz da.

Hemû hevalên wê yê sinifê û zarokên sinifeke din li hev civiyabûn û ji bo maçê grûb ava dikirin. Gava Beko çav li Gurî ket, kêfa

wî hat û got:

- Va ye hevalê me yê nû hat, bila ew jî têkeve grûba me.

Yekî ji sinifa din, ku poz û guhên wî mezin bûn, dehfek da Gurî

ûgot:

- Na, em viyê nezan û pantorpînekirî naleyizînin.

Peyvên wî lawikê poz û guh mezin, weke xencerekê li dilê Gurî

ket. Gurî xwe avête destê wî, li hev ba da û da pişt wî. Hingî bû

ayeaya lêwik û kirî bigiriya. Ger ne ji Şêro bûya, wê herdu grûb têketina

nav hev û hevdu biêşandina. Baş bû ku Şêro biazil derket û

ew zû ji hev kirin. Piştî ku wan lawikê poz û guhmezin û Gurî ji

hev kirin, zû grûb çêkirin û dest bi maça xwe kirin. Wextê wan tenê

panzdeh deqîqe mabû. Di sêzdeh deqîqên pêşî de her yekî deh

gol avêtin hev. Di herdu deqîqên dawî de, Gurî bi serê xwe goleke

din avêt. Bi wî awayî, maça wan bi yanzdeh û deh dawî hat.

Bi lêdana zengil re hemû zarok bdav bûn. Yê ku ber bi daşîrê ve

bazdan û yê ku ber bi sinfên xwe ve. . . Hewşa dibistanê di wê deqîqê

de vala bû. Gurî dîsan berî hemû zarokan kete sinifa xwe. Vê

yeka han kêfa mamosta wî anî, wê destê xwe di serê wî da û pê şa

bû. Piştî ku hemû zarok ketin hundur û li cihê xwe rûniştin, mamoste

ji bo ku Gurî navê xwe li têxt binivîsîne, ew rakire text. Gurî

bi hêdîka û bi şermokî çû ber text, rahişt tebeşîrê û bi tîpine çdoxwarî

navê xwe yê rastî, "Çepo" nivîsand.

Mamosta îcar xwe bi ser wî de tewand û hêdîka tîp bi tîp jê re

got:

- Min ji te re got, navê xwe binivîsîne.

Gurî ew navê ku li texte nivîsandibû, bi tiliya xwe nîşanî mamostê

da û got:

142

- Navê min yê rastî ev e, Çepo ye.

Mamostê bi şaşmayî jê pirsî:

- Ger navê te Çepo be, ji bo çi bavê te Gurî nivîsand?

- No, niha navê min Gurî yê. Navê min berê Çepo bû. Biçûkî, gava ez hîn sê salî bûm, hin pizik di serê min de hatibûn, pizikên mezin. . .Wer ku ez ji ber êşa wan pizikan giryabûm, bavê min rojekê bi ser min de qîriyabû û gotibû: "Lo Gurî te em ji guhan kirin, ma te xêr e tu evqasî digirî?" Ev gotinên bavê min ketin devê birayê min yê mezin û ji bo ku ew min biqehêrîne, her dem ji min re digot: "Gurî". Bi vî awayî navê min Gurî ma. Li nifusê jî Gurî ye.

Mamostê destê xwe di serê wî da û bi devkenî got:

- Porê te ji yê min bêtir e, ka ku dera te gurî ye?

- Nîvê porê min yê pir weşiyabû. Bavê min çêleka me firot û ez birime ser doktor. Piştî serîdana doktor bi çendakî, porê min şîn hat û ji yê berê pirtir bû. Mamoste daqûl bû, herdu destên xwe bi nermî li gepên wî xistin û got:

- Baş e, êdî ez dizanim bê ji bo çi navê te Gurî ye.

Piştî ku wê Gurî şande cihê wî, deftera navan derxist, li ser masê rûnişt û dest bi xwendina navan kir. Ji Nûjîn pê ve hemû zarok li wir bûn. Mamostê li zarokan mêze kir û pirsî:

- Kesî ji we Nûjîn dîtiye?

Beko destê xwe hilda jon

- Ew nexwes e, mamoste, got.

- Tu ji ku dizanî ku ew nexwes e? mamostê jê pirsî.

- Em cîranê hev in, diya wê do êvarî ji me re got. Mamoste serê xwe kil kir û got:

- Baş e.

Mamostê deftera xwe ya navan danî qorziyeke masê, rabû ser xwe

û du sê cara di hundur de çû û hat. Dû re çû ber textê nivîsandinê, rahişte tebesîrê û ji zarokan pirsî:

- Ma hûn dizanin îro çî roj e û mana wê çî ye?

Hin zarokan di mana nabûnê de milên xwe hejandin, hinan go-
143

tin na, hinan jî destên xwe hildan jor ku bipeyivin. Mamostê ji nav yên ku destê xwe hildabûn jor, Gurî hilbijart û jê pirsî:

- Mana îro çî ye lawê min?

- Îro roja zarokan e, mamoste.

Mamoste kenîya û got:

- Aferîn. Ma we rojên wilo li gund pîroz dikirin?

Gurî kete heyecanê, rûyê wî sor bû û zimanê wî li hev aliqî. Pistî ku çend caran xweziya xwe daqurtand, got:

- Na, min li gund rojên wilo nebihîstibûn. Lawê cîranê me yê xwendevanê lîseyê do êvarî ji me re got.

Mamostê ji zarokan xwest ku ew defter û pênûsên xwe derxin û resimekî ku maneya wê rojê bide çêbikin. Beko bêî ku destê xwe bilind bike û destûra peyvê bixwaze, got:

- Min çentê xwe li malê ji bîr kiriye, pênûs û deftera min tune ye.

Mamosta bi ser de qîriya:

- Ma çente tê jibîrkirin?

- Çima nayê jibîrkirin? Min çentê xwe ji bîr kiriye û pênûs û deftera min jî tune ye.

Piştî ku mamostê axînek kişand, got:

- Ma tu îro bi bisiklêtê hatiyî?

- Erê, ez bi bisiklêtê hatime, Beko bersiv da.

- Baş e, wê çaxê tu zû li bisiklêta xwe siwar bibe, here çentê xwe

bîne û were.

- Ez ê çawa herim çentê xwe bînim mamosta? Mala min dûr e. . .

Mamostê bi sertî peyva wî birî:

- Ez ji te re dibêjim, here çentê xwe bîne, zû!. . .

Beko bê dilê xwe rabû û çû. Ji nava hemû zarokan yê herî dewlemend

Beko bû. Deh dikanên bavê wî, hotêlek û belkî zêdeyî hezar

donim erdê wî yê avî hebû. Gava dinya nexweş bûya, baran bibariya,

an jî derve hebekî sar bûya, bavê Beko ew bi otomobîlê dibir û

dianî. Ger dinya xweş bûya jî, Beko bi bisiklêta xwe diçû û dihat.

144

Wî nedihîşt tu zarok destên xwe bi bisiklêta wî bikin. Ger carina

hin zarokan destê xwe bi bisiklêta wî bikirana û bixwestana seriyekî

lê siwar bibin, Beko bi wan re dixeyidî, ger zora wî di wan de biçûya,

li wan dixist. Kincên Beko hertim nû û ûtîkirî bûn. Ku kincên

hin zaroka kevin û pînekirî bûya, wî henekê xwe bi wan fikir û ew

dibehecandin. Bi qasî ku ew dewlemend bû, ew ewqasî jî pozbilind

û bi xwe bawer bû. Wî li dibistanê bi ya tu mamostan nedikir û bi

tu zarokan re xweşikahî hevaltî danetanî.

Piştî ku Beko derket, mamosta ji zarokan daxwaza çêkirina resim

kirin. Zarokan defterên xwe yê resim derxistin û dest bi çêkirina resim

kir.

Berî ku li zengilê navbirê bikeve, mamostê hemû resimên ku zarokan

çêkiribûn dane hev. Dû re ew li ser kursiya xwe rûnişt û yek

bi yek bi li hemû resiman nihêrî. Ji nava hemû resiman, wê bêtir resimê

Gurî eciband. Gurî pênc-şeş zarokên ku bi destê hevdu girtibûn

çêkiribû û her zarokek bi renekî cihê boyax kiribû.

Hîn wilo, mamostê li resiman dinihêrî, bê ku li derî bikeve, derî

vebû û Beko kete hundur. Mamosta bi ser de qîriya:

- Ev saeteke te, ma tu li ku bû yî? Ma mala te ewqasî dûr bû?
Beko dîsan weke hercar tiştin li hev anîn. Lê mamostê serê xwe
hejand û hew tişteke got.

Piştî ku li zengil ket û hemû zarok derketin derve, mamostê ew
hemû resimên ku zarokan çêkiribûn bi hev ve zdiqandin û bi dîwêr
ve kirin. Wê rojê zarok tenê dahnekî çûne dibistanê. Çaxa Gurî wilo
zû çû malê, diya wî şaş ma û jê pirsî:

- Çima lawê min, ji bo çi tu ewqasî zû hatiyî malê? Ma qey tu îro
neçûbû mekteba xwe?

Gurî çentê xwe danî ser kîsê genim û bi devkenî got:

- Belê yadê, ez çûbûm dibistanê, lê me îro zû xelas kir.

- Ez jî tirsiam, min got qey tu neçûbû mektebê. Ma tu ne birçî
yî?

Ji kêfan qet birçîbûn nedihate bîra Gurî. Lê gava diya wî li ber

145

guhên wî xist, wî got:

- Bdê, ez birçî me, ma ka çi heye ez bixwim?

- Min vê sibehê satilek mast kirî bû. Wa ye mast di bin teştê de
ye. Tu ji xwe re çend kevçiyên têxe sênîkekê û bixwe. Lê tu hinek
qîmaxê ser mêt ji bavê xwe re jî bihde wê baş be.

Çavên Gurî di nîvê serê wî de bdoq bûn:

- Mast. . .

Hema wî zû ji xwe re tacikek ji nava firaxan derxist û çend kevçî
mast berda binê tacikê. Bi wî awayî çend dilop jî rijyan erdê. Gava
wî dîsan teşt danî ser satilê, satil xwar bû û wextê hemû mast birijiya
erdê. Gurî nanê sêlê kire kovik û wek gurekî birçî xwar. Wî zû de
mast nexwaribû. Şîva wan her tim an savar, an jî şorbe bû. Şorbe û
savara ku ji êvarî de dima jî, wan adinê rojê germ dikirin û dixwarin.

Piştî ku diya wî hevîr kir û destên xwe şuştin, jê pirsî:
 Dersa te îro çawa bû lawê min?
 Gurî tiştên ku li dibistanê qewimî bûn, hezkirina mamostê ya li
 hemberî wî û jêhatîbûna xwe ji diya xwe re got.
 Diya wî destê xwe di serê wî da, ew maçî kir û got:
 Eferim lawê min, divê tu me li hemberî gundiyan me rûreş dernexî.
 Bila qet gundî nebêjin "Lawê Oso bû pêxwasê bajêr"
 Gurî ew mastê ku ji xwe re kiribû tacikê hemû xwar. Lê wî têr
 nexwar. Ji bo ku ew çend kevçiyên din jî bixwe, li ber diya xwe geriya:
 Yadê ma ez ji xwe re çend kevçiyên din jî têximê?
 Ji ber ku Gurî bi tenê bû û ddaliyê malê bû, pirê caran diya wî
 ew nedişikand. Diya wî tacika wî ji destê wî girt û jê re çend kevçiyên
 din jî xistinê.
 Dû re ji aliyekî ji kêfan, ji aliyekî ve jî ji kerban hêsir ji çavên diya
 wî hatin. Wê lawê xwe yê din, yê ku miribû, anî bîra xwe. Şevêkê
 wî jî wilo mîna Gurî hinek penîr zêde xwestibû, lê diya wî nedabûyê
 û gotibû " Na, tiştê te xwar bes e, dawiya maye jî bila ji birayê te
 re be". Roja piştî wê lawik dikeve ber traktorê û dimire. Ji wê rojê
 146
 de Gurî çî bigota diya wî bi ya wî fikir. Lê bavê wî ne wisa bû. Ger
 Gurî bixwesta tiştêkî ne li rê bike, bavê wî tu caran destûra wî nedida.
 Rojêkê bavê wî cigarek di destê wî de dîtibû, ku ne ji diya wî
 bûya, wê bavê wî ew bi lêxistinê seqet bikira.
 Piştî ku Gurî xwarina xwe xwar, çentê xwe ji ser kîsê genim daxist
 û dersa xwe xwand. Dû re wî ew tiştê ku ji çentê mamosta
 xwe derxistibû da ber pozê xwe, bêhn kir û di kefa destê xwe da.
 Kefa destê wî ji boyaxê sor bû. Piştî ku wî hebekî di kaxezê da,
 bang diya xwe kir û ew tiştê xwe nîşanî wê da. Diya wî li nik wî rûnişt,

ew tişt ji destê wî girt û lê nihêrî:

- Ev ne weke qeleman e lawê min, te ev ji ku aniye?

- Min li erdê dît, yadê.

Êvarî gava bavê wî hate malê, ruyê wî tirş bû. Wê êvarê ew ne keniya û ne jî peyivî. Lê, Gurî li ba wî rûnişt, xwe bi wî şelafi kir û dîsan weke berê dest bi tiştên ku li dibistanê bûbûn, kir. Peyvên Gurî hebekî bêhna bavê wî fireh kir. Êdî hebekî rûyê wî vebû û peyivî.

Di ser şîvê de diya wî ji bavê wî pirsî:

- Xêr e Êso, ma îro tiştin qewimî ne, kêfa te ne li te ye?

Êso bersiv neda, tenê di mana "nabûnê" de serê xwe vir de û wir de hejand.

Jinikê dîsan jê pirsî:

- Welleh helbet tiştin qewimî ne. De ka bêje, çi bû ye?

Mêrik qederekî fikirî, dû re bersiva jina xwe da:

- Xwediyê karê min dbcwaze min û çend kesên din ji kar derxîne.

- Ji bo çi Êso, pepûko?

- Ma ez ji ku zanim ji bo çi ye? Camêran derxînin wê derxînin.

Karê wan e. . .

- Ey ma ew nabêjin ji bo çi ye?

- Qey karker hew ji wan re lazim in. Ew ne mecbûr in jî bibêjin ji bo çi ye.

H7

Xwarin hew di ber jinikê de çû. Kevçiyê di destê xwe de danî û ji sifrê vekişiya. Ji kerban dixwest bigirî, lê dikir û nedikir hêsir ji çavan nedihat. Te digot qey hêsirên wê di hundurê wê de ziwa bûbûn.

Dîsan ji mêrê xwe pirsî:

- Îcar ew nabêjin, wê we kengî ji kar derxin?

- Ez niha nizanim, lê li ser kar xelk wilo qal dikin.

Gava Êso wilo got, hebekî bêhna jinikê hate ber wê. Bi qûnkişkê ber bi wî çû û bi bergerîn jê re got:

- Êso, ez bi qurban, hema ew çî bibêjin tu qebûl bike. Ji bo xatirê vî lawikê her tiştî qebûl bike. Ma ku tu ji kar derkevî em ê çilo vî lawikê bidine xwendin.

- Ger ez serkarker bertîl bikim, dibe ku ew min ji kar dernexînin, Êso bi hêvî got.

- Êso, ez bi qurban, hema wî çî xwest bidiyê.

Hîn wilo çavên wî li wî tiştê ku Gurî ji çentê mamosta xwe derxistibû, ketin:

- Ew çî ye li wê erdê? Gurî hela ka tu wê bide bavê xwe!

Gurî û diya xwe li çavên hevdu nihêrîn, diya wî got:

- Gurî ew li erdê dîtiye.

Gurî rahiştîyê û da bavê xwe. Piştî ku bavê wî bêhn kir, ji Gurî re got:

- Kuro ev boyaxa lêvan e lawo, te ev ji ku aniye?

- Min li erdê dît, Gurî bi tirs got.

Bavê wî bi hêrs:

- Rast bibêje! got. Te ev ji ku aniye? Ev ne ya mamosta te be?

Gurî dizanîbû ku bavê wî ji derewan hez nake. Ya rast got:

- Min ji çentê mamosta xwe derxist.

Diya wî wa bi şaşmayî jê pirsî:

- Te ji çentê mamosta xwe derxist?

Ji bo ku Gurî rastî ji bavê xwe re gotibû, bavê wî xwest ku meselê bi awayekî nerm çareser bike û Gurî wilo şîret bike, ku ew careke din tişteki wilo neke. Wî bi nermî ji Gurî re got:

148

- Ma te ev ji bo çî ji çentê mamosta xwe derxist, lawê min? Tu ê

çi bikî ji vê boyaxa lêvan?

Gurî lêva xwe daliqand û milên xwe hejandin:

- Nizanim, min got belkî qelemeke sor e.

Mêrik bêdeng ma û serê xwe ber bi jêr ve hejand. Dû re wî serê xwe hilda jor, qederekî li Gurî nihêrî û got:

- Binihêre, sibehê zû divê tu awayekî ji vê boyaxa mamosta xwe re çê bikî. Sibehê, hîn berî zarok têkevin dersê, tu wê li bin masa mamosta xwe deyne. An na, ger mamosta te pê bihese ku tu ketiyê çenteyê wê û boyaxa wê ji çenteyê wê derxistiyê, ew ê te ji mektebê biavêje. Ew te neavêje jî, dê te li hemberî hemû mamostan û zarokan rezîl bike. Li mektebê hew tu kes bawerîya xwe bi te tînin. Erê? Te fêhm kir? Dizî pîs e, lawê min!

Tiştên bavê wî gotin, ketin serê wî. Wî li ba diya xwe ji bavê xwe re sond xwar, ku ew ê careke din tişteki wilo neke.

Dê û bav û law wê êvarê li ser boyaxa mamostê peyivîn. Ew li ser diziyê, li ser xerabî û nebaşîya diziyê peyivîn. Lê gava cîranê wan Ehmed hate şevbuhêrkiya wan, wan peyva xwe dagerandin ser tişteki din. Gurî zêde li civatê nema, ew çû kete nava nivînê xwe û raza. Dotira rojê, sibehê zû, gava Gurî çû dibistanê, wî pêşî çû ew boyaxa mamosta xwe danî ber lingê kursiya wê.

Çaxa li zengil ket û hemû zarok ketin hundur, wextî mamostê ji zarokan bipirsiya, bê kî ketiye çentê wê û boyaxa wê ya lêvan jê derxistiye,

lê gava li ber lingê kursiyê ew çav li boyaxa xwe ket, tişteki negot, li cihê xwe rûnişt û navên zarokan xwend. Ji Nûjîn pê ve hemû zarok hatibûn. Zarok bi resimên xwe yên li dîwêr pir kêfxweş bûn. Ji nava hemû zarokan tenê Beko tu resim çênekiribû. Tenê Beko rûtirş û bê kêf di cihê xwe de rûnişt. Gurî bi wê rewşa Beko

êşiya, lê zîvirî û got:

- Ger tu bbcwazî ez û tu dikarin ji te re jî resimekî çêbikin û bila mamoste wî jî bi dîwêr ve ke? Beko li kêleka Gurî rûniştibû. Gava Gurî wisan got, pir kêfa Beko hat. Wan kirî bi hev re dest bi çêki-
149

rîna resim bikirana, lê mamoste dersek din da ber wan. Ji ber wê yekê, wan çêkirina resim hiştin navbirê. Piştî ku wan ew darsa xwe kirin û li zengilê navbirê ket, Gurî û Beko derneketin der û ji Beko re resimekî xweşik çêkirin. Piştî navbirê Gurî ew resimê ku ji Beko re çêkiribûn, ji bo ku mamosta wî jî li dîwêr bixe, dirêjê wê kir. Mamostê bi devkenê ew resim ji destê Gurî girt û ew jî di rex resimên zarokan de daliqand.

IV

Çend rojên destpêkê dibistan hebekî bi Gurî zehmet hat. Lê jê pê ve ew lê vebû. Bi zanebûna xwe jî wî xwe zû xiste çavên mamosta xwe. Hemû dersên malê, yên ku mamosta wî didayê, wî çêdikirin. Ji xwe gava ew ji dibistanê diçû malê, tiştên ku wî pêşî dikirin çddrina dersan bû. Ger wî darsa xwe çênekira, ew ne diçû nava zarokên taxê dileyist, ne jî xwarin dbcwar. Carina, ku ew pir birçî bûya, wî radihişte perçak nan û wilo tisî dixwar. Piştî xwarinê, tiştê ku wî dikir her xwendin bû.

Serê dê û bavê wî ji kêfa digihîşte asmana. Êdî baş baweriya wan hatibû ku dê Gurî xwendina xwe bidomîne û bibe tişte. Bavê wî bi meaşê xwe yê pêşî jê re pantorek û qutikekî nû jî kirî bû. Gava bavê wî jê re ew kinc kirî bûn, pir kêfa Gurî hatibû. Ji roja ku Gurî bîr biribû, wî tu caran kincên nû û xusûsî ji bo wî hatibûn çdcirin, li xwe nekiribûn. Her tim diya wî, kincên bavê wî, yên ku kevin dibûn, jê re biçûk dikirin û bi destan didirût. Carina kêlên diya wî

weke kdên koran xuya dikirin. Lê vî pantor û qutikê ku bavê wî jê re xusûsî dabû dirûtin, bêtir kefa wî ji jînê û ji dibistanê re anîbû. Gava wan herdu zarokên roja pêşî tilî avêtibûne Gurî û bi pînê pantorê wî keniyabûn, çav li kincên wî yên nû ketin, çavnebarî û dexesî kirin. Gurî jî rojekê pîneyek li milê çakêtê yekî ji wan dîtibû, lê deng nekiribû. Wî jî mîna wan tiliya xwe ber bi wî venekiribû û

150

negotibû "ha, ha, li pînê çakêtê wî binêrin".

Gurî guh nedida kincên tu zarokan. Kîjan zarok çî kinc lê bûya, ji wî re ne xem bû. Yên ku kincên wan pînekirî bûya wî bi çavekî biçûk li wan nedinihêrî û yên ku kincên wan nû û xweşik bûya jî bi çavekî mezin li wan nedinihêrî. Gurî weke mezinên bîaqil difikirî. Bavê wî jê re qala xizanî û dewlemendiyê kiribû û gotibû "gava ez weke te zarok bûm, em pir xizan bûn". Hingî Gurî peyva wî birîbû û gotibû: "Ma hûn ji niha jî xizantir bûn?"

Bavê wî destê xwe li ba kiribû û gotibû: "Lo lo, ji niha jî xizantir bûn? Niha ne xizanî ye, lawê min. Ma di dema me de nan bi destên kê diket? Pariyek nan li me hesret bû. Em giş belengaz, feqîr, tî, birçî û tazî bûn. Hingî terextor merextor li gund tunebû. Hemû cot bi destan bûn. Me bi qantir, ga û keran cot dikir. Me her kar dikir, lê em dîsan jî xizan û bêmal bûn".

Rojekê apê wî ji gund hatibû mêvandariya wan. Ew çav li rewşa wan a bajêr ketibû û gotibû: "Niha tu bi Xwedê kî ez li gund çî dikim? Çima ez jî malê bar nakim bajêr, ba we?" Bavê Gurî alîkariya wî kiribû û mala wan bar kiribû bajêr, lê piştî du-sê mehan ew dîsan poşman bûbû û bi paş de vegeyriyabû gund. Ji ber ku ne lawê wî dikarîbû li dibistanên bajêr bixwenda, ne jî wî dikarîbû ji xwe re karek peyda bikira. Hingî, gava dîsan mala apê wî vegeyriyabû gund,

Gurî ji bo mêvandariyê çend rojan bi wan re çûbû gund. Hemû zarokên gund lê civiyabûn û ji ser bajaran pirs jê kiribûn. Gurî tiştên di derheqa bajêr de dizanîbû û tiştên ku dîtibûn, ji wan re gotibû. Ji wan re qala malan, dikanan, dibistanan û sînemayan kiribû. Hingî piraniya zarokan ji wî bawer nekiribûn. Dê çawa zêdeyî sed dikanan di rêzekê de hebûya û xaniyên pênc-şeş qatî hebûya? Tew sînema? Dê çilo însan li ser dîwarekî spî bisekinin, bipeyivin û bileyizin? Pir tiştên ku Gurî ji zarokan re gotibûn, neketibû serê wan. Hin zarokan di dilê xwe de gotibûn: " Na lo, Gurî jî çûye bajaran û bûye derewîn. Yê ku diçin bajaran wilo xerab dibin û dibine derewîn". Hinan jî di dilê xwe de gotibûn: " Xwezî me jî ji xwe re bajar

151

bidîta".

Gurî li zarokan şaş û ecêbmayî mabû. Yaho çima zarokan ji wî bawer nedikirin? Gava wî ji zarokên bajêr re qala gund û jiyana gund fikir, zarokên bajêr jê bawer nedikirin û gava ku wî ji zarokên gund re qala bajêr û jiyana bajêr fikir, zarokên gund ji wî bawer nedikirin.

Çaxa zarokan digotin:

- Em ji te bawer nakin.

Wî jî digot:

- Ger hûn ji min bawer nakin, herin ji xwe re bi çavên xwe bibînin.

Baş bû ku rojekê mamosta wan li ser gundan û li ser rewş û jiyana gundiyan peyivî bû.

Hingî zarokan di dilê xwe de gotibûn. " Lawo Welleh xebera Gurî ye, ew rast dibêje".

Gurî kêman derew dikir. Ji xwe dîn û îmana wî ji diziyê diçû.

Hinekan li ba wî qala diziyê bikira, ew hêdî radibû ser xwe û ji nik

wan dida rê û diçû. Lê wî bi xwe herdu jî kiribû, Hem dizî, hem jî derew. . . Ew bi şîretên bavê xwe ji ser wê riya şaş vegeyabû.

Bavê wî jê re gotibû:

- Lawê min, tu derew û diziyê neke, wekî din tu çî dikî bike. Ger tiştek ji te re lazim bû, tu ji min bixwaze, ger qeweta min bigihîjê, ez ê ji te re bikirim. Ne hewce ye ku tu herî derew û diziyê bikî. Ew ji riya şîretên bavê xwe dernediket. Bi wî awayî ew hem li ber dilê bavê xwe, hem jî li ber dilê diya xwe şêrîn dibû. Wî xwe bi wî awayî baş xistibû çavên mamosta xwe jî. Ji xwe mamosta wî rojekê ji bavê wî re gotibû:

- Ev heft salên min in ku ez mamostetiyê dikim, ez hîn li şagirtêkî weke Gurî zîrek û bi edeb rast nehatime.

Lê bavê Gurî ew gotinên mamostê ji Gurî re negotibûn.

Bi wî awayî pênc-şeş mehên Gurî li wê dibistanê qediyên. Wî hema hema xwe bi hemû zarokan û bi hemû mamostan dabû hez ki-
152

rin. Ji xwe Beko rojekê Gurî nedîta sebra wî nedihat. Bi xêra Gurî êdî Beko jî guh dida dersên xwe û bi hevalên xwe yê sinifê re xweş dida û distand. Ger wî weke berê pêxwasî û quretî bikira, ew bi tenê û bê heval dima. Pêşî di sinifa Gurî de zarok bûne du grûb.

Grûbek li aliyê Gurî bû, grûba din jî li aliyê Beko bû. Lê vê yekê han pir dom nekir. Piştî wextekî kurt tu berberî di navbera herdu grûban de nema û herdu grûb bûne destek. Wan bi her awayî zora sinifên din dibirin. Li dibistanê çî qayîşkişandin çêbibûya, sinifa Gurî yekemîn derdiket. Ji xwe bi futbolê ew di hemû dibistanê de hatibûn naskirin.

Rojekê, gava Gurî ji dibistanê derket ku here malê, sê zarokên sinifa çaran riya wî birîn. Lê Gurî he kete heyecanê, ne jî tirsîya; bi

xweşikahî ji wan re got:

Lawo, dev ji min berdîn û bi riya xwe de herin. Yê min ez şer naxwazim.

Yekî ji wan zarokan xwe avête stûkura wî û got:

Tu ê careke din li dibistanê quretiya bikî an na? Gurî destê wî ji stûkura xwe avêt û dîsan bi nermî got:

Binêrin lawo, ez tu quretî muretiya nakim. Ez ji we re dibêjim bi riya xwe de herin, ez şer naxwazim.

Îcar yekî din xwe da pêşiyê, destê xwe avêt çenga Gurî, bilind kir ûgot:

Kuro li çavê min binêre, ma tu Xwedayê vê dibistanê yî ku tu evqasî quretiyan dikî? Ha!... Ma tu bû çî ûlan!... Tu bûyî çî ku tu hemû zarokan didî dû xwe? . . .

Gurî du-sê caran serê xwe vir de wir de hejand. Piştî ku bi hêrs axînek kişand, got:

Kuro ez ji we re dibêjim, dev ji min berdîn û bi riya xwe de herin Hingî yekî ji wan zarokan pehînek li çoka Gurî xist. Gurî hêrs bû û ji hêrsan laşê wî mîna hdkanê hejiya. Lê, ji wan zarokên din webû, ku Gurî ji tirsan wilo dilerize. Gurî hema zû çentê xwe avête er-

153

dê û hutikek li zikê yekî ji wan xist. Herduyên din ji tirsan bêî ku li paş xwe binihêrin, baz dan. Yê din jî destê xwe avêt zikê xwe, kuliya û bi dû hevalên xwe baz da.

Gurî rahişt çentê xwe û ber bi malê ve lezand.

Gava dibistan xdas bû û Gurî ji sinifa sisiyan derbasî sinifa çaran bû, mamosta wî ew hemêz kir û got:

- Gurî, heya ji te bê tu bbcwîne lawê min. Ez hêvîdar im tu ê bigihîjî armanca xwe.

Evarî Gurî qerna xwe nîşanî diya xwe û bavê xwe da. Ji kêfan dê û bavê wî kirî bifiriyana. Wê êvarê bavê wî çû sûkê pirtûqal, sêv, şekir û biskiwît kirî û ji bo Gurî kêf kirin; xwarin, vexwarin. Adinê rojê jî kîloyek goşt kirî û cîranê xwe ezimande xwarinê. Piştî şîvê bavê wî pakêtek anî û ji Gurî re got:

- Ev pakêt ji te re ye, ka tê derxe bê çî tê de ye?

Gurî li pakête nihêrî, fikirî û got:

- Ez nizanim.

Bavê wî pakêt nedayê, dîsan jê pirsî:

- Sê caran bibêje.

Gurî dîsan li pakête nihêrî. Piştî ku biçûkbûn û mezinbûna pakête di mêjiyê xwe de derbas kir, got: .

- Gomleg e.

Bavê wî serê xwe vir de û wê de hejand:

- Du carên te man.

- Ez nizanim, çî ye, ka bide min.

- Na, tu têdernexî ez nadime te, bavî wî bi dilşahî û bi henekî got.

Gurî dîsan hebekî fikirî, paşê mîna ku hate bîrê:

- Ha, pantor e, bi kêfgot.

Bavê wî di mana "erê" de serê xwe kil kir û keniya:

154

Te têderxist. Ha ji te re, li wê bejna te pîroz be.

Hema Gurî zû bi zû pakêt vekir, pantor jê derxist û li xwe kir.

Dû re bazda ber neynikê û li xwe nihêrî. Pantor tam li gora wî bû.

Bejna wî kurt bû. Porê wî yê reş kurîşk û kurt bû. Ew ne qelew bû,

lê bi navmil xuya dikir. Wî piştî ku xwe li ber neynikê baş ediland,

çû civatê û xwe nîşanî wan da. Gava diya wî bi wî awayî çav li wî

ket, kêfekê ew girt û bi dilşahî got:

Wey ez bi qurbana zavakê xwe yê biçûk bim. Binêrin, bê pantorê wî çiqasî li bejna wî tê. Li te pêroz be lawê min, tu bi xêr û selamet biqetînî.

Gurî çend carên din jî baz da mezela din û di neynikê de li xwe nihêrî. Piştî ku Gurî ji ber neynikê, ji mezda din vegeyriya, bavê wî jê pirsî:

Pantorê te çawa ye, lawê min, te jê hez kir?

Erê, min pir jê hez kir, Gurî got.

Çaxê xewê, Gurî pantorê xwe baş qat kirin, kursiyek kişande ber serê xwe û ew li ser kursiyê bi cih kir. Heya dereng, di nava nivînan de, dîsan ew li pantorê xwe difikirî.

VI

Wê salê hejmara bajêr ji sî hezarî bû çil hezar. Ji gundên dorhêlê û ji bajêr dorhdê ên biçûk jî mirovan bar kirin bajêr. Her roj, ku mirov biçûya ser rîya bajêr, mirov dê kamyonên malan, ên ku ji gundan bar dikirine bajêr bidîtana. Ew bajarê biçûk, yê xerabe û wêran, di wê salê de bû bajarekî mezin, xweş û bajarê kar. Riyên nû yên qîr û zift çêbûn, otobusên belediyê û texsiyên nû hatin bajêr. Yên ku ji gund û bajarên dorhêlê dihatin, piraniya wan dest bi tevirdan û hevdana pembo kirin. Hejmareke biçûk jî dest bi qaçaxkeriyê kirin. Lê piranya wan dest bi tevirdanê, eşêfê û hevdana pembo kirin. Ji bilî yên ku malên wan li bajêr bûn jî, gundî bi demsalî ji bo kar hatine bajêr. Gava hejmara bajêr wilo bi carekê ve bilind bû, bajarê li

155

hemberî gundiyan derketin, li wan xistin, ew tehdît kirin û nehiştin ew êdî werine bajêr. Bi wî awayî dîsan hin gundî ji tirsê bajariyan vegeyriyan gundên xwe. Lê tenê hejmareke biçûk vegeyriyan gundan.

Hejmara mezin jî xwe kirin yek û li hemberî bajariyan serî hildan. Heya ku berberiya di navbera gundî û bajariyan ji navê rabû, demeke dirêj derbas bû. Gundî jêhatî û karkir bûn. Ji keda wan pê ve tiştekî wan tune bû. Lê bajariyên bi cih xwedî mal û dikan bû. Jinên gundiyan ên ku mast û hêk ji bo firotinê dianîne bajêr, kesên bajarî çav davêtin namûsa wan, tiştên nemayî bi serê wan dikirin. Peyayên kal, ên ku bi keran êzing dianîn bajêr, zarokên dewlemendan henekên xwe bi wan dikirin, barên êzingên wan werdigerandin û bi xeber û gotinên ne li rê ew diêşandin. Gundiyên ku li bajêr bi cih bûn, êdî tu tirsaw ji bajariyan nema. Yê ku ji wan ji xwe re çayxane, xwarinxane û dikan vekirin, ên din jî xwe li wan digirtin. Lê ji gundiyan ên ku ev îmkan kete dest wan tenê hejmareke biçûk bû. Hejmara mezin jî bê kar man, an jî salê tenê du-sê mehan kar bi dest wan ket.

Piştî demekê ew berberiya bajarîti û gundîtiyê hêdî hêdî ji navê rabû. Lê îcar berberiyek nû serî hilda. Berberiya di navbera karker û maldaran de... Gelek caran maldaran perê karkeran bi sê-çar mehan bi derengî dbdstin û carinan jî bi fen û filtan nivê perên wan dixwarin. Ji ber ku karker ne di tu sendîkayan de bûn, mafê wan û pirsê jî tunebû. Maldaran ji ber vê yekê qet ji wan neditirsiyan û tu hesab ji wan nedikirin. Ku carinan hin karker li hemberî maldaran rabûna û li mafê xwe bipirsiyana, ew kes zû ji kar dihatin avêtin. Ji ber ku karker pir bûn û kar hindik bû, tu hewcedariya maldaran zêde ji karkeran tune bû. Gava maldarek sibehê zû biçûya çarşiyê, ji karkeran mirov ax biavêta li erdê nediket. Wî maldarî karker li hev dicivandin û bazara kar bi wan re dikir. Dawî dawî bi buhayekî hindik komek karker didan ber xwe û dibir berdida nava erdê xwe. Ji rohilat heya bi roava bi wan kar dikir û rojê perayekî pir hindik

didan wan. Karkerên Çukurovayê bi du qatî wan pere distandin û
156

karên ku dikirin jî ji yê wan hindiktir bûn. Hingî hin kes ji bo kar
çûne Çukurovayê, lê dîsan kara wan di zerara wan de derneket û
ew berepaş vegehiyan. Ji ber vê yekê mal ji wan re ji dûriyê çêtir bû.
Ger ew li malê nexweş biketana, dê nas, dost û mirovên wan guh
bidana wan. Lê li Çukurovayê? Ma dê kê li kê binihêriya û alîkariya
kê bikira? Kî li nava wan erdê Çukurovayê nexweş biketana, ew wilo
bi stûxwarî dimirin û tu kes li wan xwedî dernediketin. Ji xwe
nexweşî, ta û mirin ji bo karkerên Çukurovayê jiyana rojê bû. Li
bajêr jî, karker bêtir diketin ber makînan û dimirin. Carna jî kamyon
û traktorên karkeran li hev diqibîn, karker birîndar dibûn û
dimirin. Ji xwe birîndarên ku bihatana nexweşxana bajêr jî xelasiya
wan tune bûn. Ji ber ku li wê nexweşxana bajêr ya mezin, carina
doktor tunebû.

Rojekê, danê nîvro sê-çar teksî di sûka bajêr re derbas bûn û ber
bi nexweşxanê ve çûn. Li nexweşxanê mirovên ku bi alîkariya doktoran
û xelkê ji tirimpdan hatin derxistin, nîvê wan serî pdbcî bûn,
yên hinekan jî dest û lingên wan jê bûbûn. Gava hinekan ji şofêran
pirsîbûn: " Gdo ma xêr e, ev çi kes in?" Şofêran gotibûn: "Ev karkerên
pembo ne, kamyonên wan di pirê werbûye". Ji xwe gava mirov
li yê wan ku hatibûne nexweşxanê dinihêrî, mirov bawer nedikir dê
kes ji wan xelas bibin. Bi rastî jî wilo bû. Piştî hefteyekê, ji keçikeke
biçûk pê ve tu kes xweş neman, hemû mirin. Keçika ku nemir û xelas
bû jî, seqet û bi lingekî ma.

Dîsan rojêke din li bajêr xelkê ji hev pirsîn. Jinan li ser tenûran ji
hev pirsîn:

- Ma we bihîstiye xwehê, dibêjin dîsan nexweşxane ji karkerên

pembo yê birîndar tijî bûye.

Mêran li çayxanan ji hev pirsîn:

- Yaho dibêjin, dîsan hin karkerên birîndar anîne nexweşxanê, ma kesî ji we bihîstiye?

Hingî yekî ji wan peyayên li çayxanê ji çayger pirsî:

- Lawo, ma haya te jê heye, bê ew nexweşên ku hatine nexweşxa-
157

nê kî ne?

- Dibêjin karkerên pembo ne dîsan. Dibêjin ku karkeran kuvarkên bi jehr xwarine û hemû bi jehrî ketine. Heya niha du kes ji wan mirine.

Yekî ji peyan:

- Hda, hela, got.

Lawikê çayger peyva xwe domand:

- Bi saloxan van karkeran li gundekî jor di emrê axayekî de pembû didane hev. Lê piştî ku sermayê û baranê dest pê kiriye, karkeran xwestine herin malên xwe. Lê axê nehiştiye, dest daniye ser perên wan û gotiye:

"Heya tayek pembûyê min li erdê bimîne ez çerxiyekî nadime we. Divê hûn pembûyê min giştî biçinin".

Karker jî mecbûrî li ser erd, di konên xwe de mane. Lê piştî ku baran dibare, konên wan bi ser wan de dikevin û hemû dahn û xwarina wan li ber avê diçin; ew mecbûr dimînin ku bi çolan bikevin û ji xwe re pincêr û kuvarkan bidine hev, da ku ew xwe pê xwedî bikin. Şansê wan yê xerab, kuvark hemû bi jehr derdikevin û hemû karker dikevin haletê mirinê.

Xwediyê çayxanê bi hêrs bang çayger kir:

- Kuro, ma tu çî sohbetê dikî, ev çayê li vir bûne qeşa!

Çayger peyva xwe birî û ber bi ocaxê ve bazda. Piştî ku çayger çû, yê herî ciwan kursiya xwe ber bi pêş ve kişand û bi dengekî nizim got:

- Ma hûn nabêjin em çi bikin, lo? Ma em ji van maldaran re tiştêkî nebêjin?

Yê herî bi emir, ku porê wî spî bûbû û çend tayên spî ketibûn simbdê wî, kursiya xwe ber bi masê ve kişand û got:

- De here lo! Ma em dikarin bi vî awayê xwe çi bikin û ji maldaran re çi bibêjin? Ji we weye ev karê zarokan e? Ji xwe peyva li çayxanan û li ser masan pir xweş e.

Ev peyvên peyayê hebekî bi emir, li telê yê ciwan ket. Yê ciwan 158

hebekî bi hêrs got:

- Ji xwe heya yên mîna we tirsonek hebin, wê halê me ev be. . .

- Kuro tirsonek yên mîna te ne! Tu li gorî emrê xwe bipeyve!. . .

- Çend tayên spî ketine porê te, ji te weye tu bîaqil î niha?

Peyayê bi emir bi milê wî girt, ew hebekî dehfda û bi hêdîka got, ji bo ku deng neçe mirovên din yên li çayxanê:

- De rabe ji vir lo, here ji xwe re li cihekî din rûnê.

Yê ciwan zû cigarek ji pakêta xwe derxist û vexist. Dû re wî serê xwe bi hêrs hejand û got:

- Welleh ez ji xwe şerm dikim, an na. . .

Peyayê bi emir rabûyê ku lê bixe, lê yên din ew dane rawestandin û ji herduyan re gotin:

- Kuro dev ji van awayên xwe û dev ji vê serhişkiyê berdin. Ne em dibêjin em ê alîkariya karkeran bikin. Ger em her roj li hev bixin û dilê hevdu bihêlin, em ê çawan alîkariya karkeran bikin? Dibe ku we nebihîstibe, lê dibêjin, dê xwendevan karkeran têxin grevê.

Ne hewce ye ku hûn li vir rûnên û li ser problema karkeran dilê hevdu bihêlin.

(Mêrik cigarek vexist û peyva xwe domand)

Lê nivê karkeran naxwazin dev ji karên xwe berdin. îcar xwendevanan biryar dane, ku sibehan zû derkevin ser riyên û karkerên ku bixwazin herin kar, wan bi paş de vegehin. Ev yeka han ne tenê li vir dibe, wê li gelek bajaran bibe, ji xwe tesîra xwendevanên wan bajaran e, ku li xwendevanên me bûye. Lê ez ditirsim esker û polîs li karkeran bireşînin.

Ew di wir de sekinî û li çavên yên din nihêrî. Gava tu deng ji kesî derneket, mêrik peyva xwe dom kir:

- Hema çawa be wê karker bi tiştên wilo bihesin. Ew ê bizanibin ku grev hene. Ger xwendevan bêne girtin jî xem nake. Ji xwe jiyana van xwendevanên me her tim di talûkê de ye. Ger ew xwe bi xwe pevneçûna û hevdu nekuştana wê çiqas baş ba.

Di wir de yekî peyva wî birî:

159

- Bi rastî jî wan xwe bi xwe hevdu nekuştina, dikarîbûn gdek tişt bikirana.

Gava du polîs ketin hundurê çayxanê, wan peyva xwe dagerandin ser tiştê din. Lê ev munaqêşe di nava bajêr de bdav bûbû.

Her kesî, li her derê qala karkerên pembo dikirin. Xwendevanan hefteyekê dev ji dibistanên xwe berdan û bi karkeran re çûne ser erdan.

Wan di hundurê wê heftê de karker hînî pir tiştan kirin. Mîna şagirtan wan guh didane xwendevanan û li wan guhdarî dikirin.

Ew têgihîştibûn ku xwendevan ji bo wan têdikoşin. Ma ne ji bo wan bûya, dê ji bo çî xwendevanan dev ji dibistanên xwe berdana û biçûna nava erdan. Xwendevan sibeha zû bi wan re li traktor û

kamyonan siwar dibûn, diçûne nava erdan û êvaran jî bi wan re vedigeriyan.

Her ku kamyon û traktorên wan diçûne nava erd û vedigeriyan, wan di nava sûkê de bang dikirin:

- Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Karkeran li ser erdan bang dikirin:

- Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e!

Xwendevanan li ser dîwaran dinivîsandin: "Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e!"

Bi vî awayî, hemû bajar, bi van gotinên "Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e" hesiyan.

Pir tê re neçû karker ketine grevê. Ev devjekarberdana karkeran xwendevanan plan kiribûn. Armanca greva wan ew bû, ku roja karkeran ji sih lîran bibe çil û rojê heyşt saet kar. Lê maldaran ev pêşniyara karker û xwendevanan qebûl nekirin û xwestin bi darê zorê karkeran bibine ser erdan. Xwendevan li hember vê zilma maldaran derketin û nehiştin karker herin ser erdan. Dû re xwendevanan belavok nivîsandin, armanca grevê tê de dane xuyakirin û ew bdavok di nava bajêr de bdav kirin. Paşê xwendevanan li ser cawên spî û mezin "Roja palan erzan e, heqê kîlok bacan e" nivîsandin û sibehekê zû, di gd karkeran di sûkê de meşiyên. Li ba stasyona trêne polîs û leşker derketin pêşiya wan. Ew polîs û leşker hema gihîştine kê
160

ew dane ber pehîn û qundaxên sîlahan. Xwendevanan ev yeka han texmîn kiribûn, loma ji hemûyan re gotibû:

- Ger polîs û leşker bêne me û li me bixin jî, hûn li hemberî wan ranebin. Em bê hêz in, ew ê me perîşan bikin.

Kesî li van gotinan guhdarî nekirin. Gava polîs û leşkeran li karkeran

xistin, yekî ji nava karkeran kevirek avêt cîpa eskeran. Bi avêtina wî kevirî re, weke ku hêzek ji karkeran re çêbû, her yekî ji hda xwe ve kevir avêtin esker û polîsan. Lê esker û polîsan jî bi sîlahan bersiva wan dan.

vn

Diya Gurî zû de hişyar bûbû û li deng û qerebalixa sûkê guhdarî dikir.

- Welleh hebe tune be dîsan hukûmet û telebe ketine ber hev, wê bi tirs got.

Carekê ji nişkê ve û bi dengê hebekî bilind got:

- Ma ne karkeran dev ji kar berdane îro? Gelo ne xwedîerd û telebe bin?

Paşê wê ber bi nivînê Gurî ve bazda, bi herdu destan ew hejand û got:

- Gurî, Gur! Hda tu rabe ser xwe lawê min! bajêr hevdu xwar!

Ma dengê teqa teqa sîlahan nayê te?

Ji ber ku Gurî şeva çû dereng raza bû, ew bi carekê ve hişyar nebû.

Tew gava diya wî bang wî kir, ji wî webû ku xewn e.

Îcar diya wî lihêf ji ser wî avêt, bi herdu destan milên wî hejandin, bi dengê bilind û bi heyecan got:

- Gurî!... Hda tu rabe ser xwe lawê min! Ma deng nayê te?

Dinya xerab bû! Bavê te jî ne teva wan be lawo?

Piştî ku Gurî xwe zîvirande vî alî û wî alî, rabû ser xwe û li ser nivînê

xwe rûnişt. Çer ku Gurî li ser xwe rûnişt, destek sîlah, li kuçê,

li ber deriyê wan hate berdan. Gurî pêşî tirsîya, paşê rabû ser xwe û

161

bi tena derpîkê kinik baz da ber deriyê hewşê.

Diya wî bang wî kir:

- Kuro were hundur lawo, wê gulle li te bikevin!

Hîn wilo birek leşker, polîs û karkeran bera ser pişta hev dan û derbas bûn. Gurî ji ber teperep û bazdana wan tirsîya û berepaş vegeriya hundur.

Diya wî du-sê caran di hundur de çû û hat, li resimê bavê wî yê bi dîwêr ve bû, nihêrî, kelogirî bû û got:

- Gurî, lawê min, gdo tişteke bi bavê te jî neyê? Ne wî jî dev ji kar berdaye, ew jî bi xwendevanan re ye. Tişteke pê neyê, bavê diya xwe? Ku ew bê girtin an kuştin, em ê çî bikin, wê kî li me binêrin?

Gurî bi wan peyvên diya xwe hêrs bû, dîsan xwe negirt û ber bi deriyê hewşê ve bazda. Lê diya wî bi dû wî de baz da, bi milê wî girt, ew ber bi hundur ve kişand û got:

- Kuro were hundur, ma xwîna te ketiye çavên te? Ma dengê teqe teqa sîlahan nayê te?

Dengê teqe teqa sîlahan, dengê hawar û gaziye, dengên giryê zaro û pîrekan tevlîhev dibûn û li bajêr belav dibûn. Carina jê wan dangan tirs dixistin dilê Gurî, carina jî ew hêrs dikir.

Adeteke Gurî hebû; ew ne zû ditirsîya, ne jî zû hêrs dibû. Gava hêrs bibûya jî ew pir hêrs dibû. Çavên wî beloq dibûn, laşê wî dixuriya û çongên wî weke hêlkanê dihejiyan.

Piştî ku hebekî dengê qerebalixa bajêr hate birîn, ew li ber diya xwe geriya:

- Yadê, ma çî dibe lê, îzna min bide ez herime bajêr. Va ye dengê teqîna sîlahan jî hate birîn.

Ji xwe qidûmê diya wî şikestibû. Her ku qala şer û kuştinê dibû li wê wilo dihat. Rûyê wê zer dibû û xwîna wê ziwa dibû.

Bersiva ku wê da Gurî dîsan "na" bû.

Gurî îcar bi hêrs got:

- Welleh tu bihêlî nehêlî ez ê herim! Ma te xêr e tu evqas ditirsî?
Ji te weye tenê bavê min li bajêr e?

162

Diya Gurî li ber wî geriya:

- Baş e lawê min, tu diherî here, lê qet nebe çavê xwe li bavê xwe bigerîne, bê tu wî nabînî.

Gurî derket û baz da. Gava ew li serê kuçê çav li eskeran ket, wî gavên xwe sist kirin û hêdî meşiya. Ew li serê dikanan, li ber çayxana Hemo li hevalekî xwe rast hat. Hevalê wî bi kêf hate ba wî, destê xwe li milê wî xist û bi henek got:

- Tu heya niha di ku de bûyî, lo! Piştî ku şer betal bû tu derdikevî?
Eh, min jî digot tu mêrxas î. Ji sibehê ve em û esker û polîs bera ser piştta hev didin.

Gurî bi peyvên hevalê xwe hebekî êşiya. Xwe di wê deqîqê de newêrek, tirsonek û xerab dît.

Dû re wî ji lêwik pirsî:

- Ka çi bûye, ma kes hatine kuştin an girtin?

Lêwik bi destê wî girt, kişand û got:

- Ka tu were em herin ba polîsyanê.

Gurî dîsan jê pirsî:

- Erê, em ê herin, ma pir kes hatine girtin?

Piştî ku ew ber bi polîsyanê ve meşyan, lêwik got:

- Pir kes hatin girtin, lê ew dîsan hatin berdan. Niha tenê neh-deh kes girtî mane.

- Yê girtî kî ne?

- Tu çiko nas dikî? (Piştî ku hebekî fikirî, peyva xwe domand)

Tu Kerîz Humal nas dikî?

- Erê, ez wî nas dikim, ma ew jî hatiye girtin?

- Erê, Kerîz Humal jî hatiye girtin. Wekî din çend mamoste, çend telebe û çend karker girtî mane. Dibêjin mamosta we jî tevlî wan e.

Gurî li ber mamosta xwe ket, lê Kerîz Humal ji bîrê nediçû.

- Ji bo çi Kerîz Humal hatiye girtin? wî pirsî, ma wî çi kiriye, ku ew hatiye girtin?

- Eh... Wdleh çi kir Kerîz Humal kir. Pêşî namûs ji wî çêbû û 163

wî kevir avête polîsan. Lê pir kes dibêjin " Kerîz Humal nebaş kiriye, ku kevir avêtiye polîsan û hemû bajar bera ber hev daye".

Heya ew gihîştin ber deriyê polîsxaanê, lêwik ji Gurî re qal kir.

Wilo bi heyecan digot, ku wî carina xwe diavête vî alî û wî aliyê Gurî. Gurî zehfpoşman bûbû ku ew derneketibû û tevlîwan nebûbû.

Lê gava ew gihîştin ber polîsxaanê, Gurî şaş ma. Li ber deriyê polîsxaanê û li dor polîsxaanê mirov ax biavêta li erdê nediket. Wir tijî mirov bûn. Gelek mirov jî derketibûn ser kursiyên çayxana hemberî polîsxaanê û li hêla polîsxaanê dinihêrîn.

Hîn wilo dengê bi aparloyê hat:

- Milleet!. . . Guhdarî bikin!. . . Ku hûn di hundurê panzdeh deqîqan de belav nebin, em ê emrê lêdanê bidiiin!. . .

Wî dengî sê-çar caran li ser hev wilo got. Mirovên ku li wir hatibûn ser hev bêçare man û hêdî hêdî belav bûn. Wan dizanîbûn ku ew belav nebin, dê polîs û leşker li wan bireşînin.

Herçiqas Gurî di nava wê qerebalixê de çavên xwe li bavê xwe gerandin jî, dîsan nedît. Wî ji çend kesên nas pirsî, lê wan jî bavê wî nedîtibûn. Gava ew vegeheriya mal û gihîşte ber deriyê hewşê, kirî dîsan bi paş de vegeheriya, lê venegeriya, deriyê hewşê vekir û kete hundur.

Diya wî li hewşê qutikê wî radixist:

- Tu hatî lawê min? wê got.

- Lê min bavê xwe nedît, Gurî got. Ma ez dîsan vegerim û lê bigerim?

Bavê wî ji hundur bang kir:

- Gurî, were lawê min, va ez li mal im.

Gurî bi şaşmayî û bi kêfji diya xwe pirsî:

- Ma bavê min hatiye malê?

- Erê lawê min, ew berî niha bi nîvsaetekê hat.

Gurî reviya hundur û ji bavê xwe pirsî:

- Ma tu kengî hatî, bavo?

- Ez berî niha bi demekê hatim, lawê min.

164

- Ma te jî dev ji kar berdabû?

- Erê, lawê min, min jî dev ji kar berdabû.

Rûyê Gurî hebekî tirş bû. Bi hêrs got:

- Ger we ê dev ji kar berdaya çima te ji min re jî negot. Ma ji bo çî te haya min jî negihandiyê? Ji te weye ez hîn zarok im? Bavê wî hebekî fikirî û li bersivekê geriya:

- Na lawê min, bi serê te min jî nizanîbû ku em ê îro dev ji kar berdîn. Erê min bihîstibû, lê min nizanîbû ku îro ye.

Gurî dîsan bi hêrs got:

- Na Wdleh te zanî bû, lê te ji min re negot.

- Bi serê te min nizanîbû, bavê wî dîsan got.

Diya Gurî destên xwe bi dawa xwe paqij kirin û kete hundur. Li mêrê xwe û li lawê xwe nihêrî û ji wan pirsî:

- Çî ye, hûn li ser çî dipeyivin?

Bavê Gurî destê xwe ber bi Gurî ve dirêj kir û got:

- Gurî dibêje ku "we ê îro dev ji kar berdaya çima te ji min re negot

.
Diya Gurî kenîya û bi henek got:

- Eh, ma ji te re bigota te ê çî bikira? Ji te weye ev karê zarokan e? Herdem wisa bû. Ger tiştekek bibûya û Gurî lê bipirsiya, hem diya wî û hem jî bavê wî digotin: " Ev ne karê zarokan e lawê min". Gava wan wilo digotin, Gurî hêrs dibû. Ew wisan hêrs dibû, ku carinan ji hêrsan digiriya. Gurî dîsan weke her car hêrs bû û bi wê hêrsbûnê ji diya xwe re got:

- Çî ye, hema çî dibe tu dibêjî "ev ne karê zarokan e". Ma ji te weye ez qet tiştekekî fêhm nakim?

Bavê Gurî peyv guhert û ji diya wî pirsî:

- Ka tiştekek tune ye ez bbcwim lê, ez ji birçîna mirim.

Diya Gurî rabû ser xwe, ew tirşika ji do êvar de mabû, li hewşê, li ser kuçik germ kir û anî li ber Gurî û bavê wî danî. Bavê Gurî bêh ku destên xwe bişo, ew kişiya ser xwarinê û xwar. Lê Gurî wilo hîn bûbû, ku heya wî destên xwe neşuşt, wî tu caran xwarin nedixwar.
165

Piştî ku Gurî destên xwe şuştin, hat li ba bavê xwe rûnişt û bi wî re xwar.

Diya wî di ser xwarinê de ji bavê wî pirsî:

- Erê we dev ji kar berda, ma ka we çî safî kir?

Mêrik pariyê di devê xwe de cût û got:

- Me her tişt safî kir. Em bi qeweta xwe hesiyan.

- Pepûko ma ew çî dengên sîlahan bûn? Ma kes hatine kuştin?

- Na, na! Tu kes nehatine kuştin, tenê yek birîndar bû ye. Şansê wî hebû ku gulle ji navê û berjêr lêketibû, an na xelasiya wî tune bû.

Gurî peyv ji diya xwe girt û ji bavê xwe pirsî:

- Dibêjin Kerîz Humal pir mêrxasî kiriye, ma rast e?
- Erê, rast e. Pêşî namûs ji wî çêbû û wî li ber esker û polîsan dest hilanî. Lê hinek jî dibêjin wî ne baş kiriye.

Diya Gurî:

- Ev Kerîz Humal çi teba ye, çima navê wî wilo ecêb e?

Gurî kenîya, bavê wî dom kin

- Kerîz Humal lê, yekî dînik e; li sûkê her kes qeşmeriyên xwe pê dîkin.

- Ger dînik e, çima ji we re serokatiyê dîke?

Gurî kenîya, wî dizanîbû ku diya wî çîrok fêhm nekiriye. Piştî ku wî xwarina di devê xwe de daqurtand, got:

- Na yadê, ew ne serok e. Lê dibêjin, wî mêrxasî kiriye û li hemberî esker û polîsan dest hilanî ye.

- Rast e, bavê Gurî got. Dînik dibe, çi dibe bila bibe, camêr mêrxas derket.

Jinikê dev ji bîaqîlbûn û dînbûna Kerîz Humal berda û dest bi karê malê kir. Gurî jî ji sifrê vekîşîya, çû li ser mînderê rûnişt û ew rojnameya ku lawê cîranê wan berî sê-çar rojan dabûyê, xwend. Bavê wî jî piştî ku têr xwar, xwe li ser mînderê dirêj kir û pir tê re neçû bi xew re çû.

\66

vin

Bihar çû, havîn çû, payiz çû, salek derbas bû, hîn jî dibistana Gurî venebûbû. Gurî her sibeh radihişt çentê xwe û diçû dibistanê, lê her carê midûr ew bi paş de vedigerand û digot:

- Îro jî mamoste tune ye.

Rojekê Gurî digel Beko û Nûjîn ji midûr pirsîn:

- Ka çi bi mamosta me hatiye, ew ê kengî were?

Midûr pêşî nexwest bersiva wan bide, dû re hebekî bi hêrs got:

- Mamosta we û çend mamosteyên din hatine girtin.

Gurî ji midûr pirsî:

- Ew ji bo çi hatiye girtin? Ew ê kengî were berdan?

Midûr li dora xwe nihêrî û hêdî di ber xwe de bersiva Gurî da:

- Ew ji bo devjekarberdana karkerên pembo hatiye girtin.

- Ji bo devjekarberdana karkerên pembo?

- Erê, ji bo wê.

Midûr hew peyivî, cigara xwe vexist û derkete derve.

Gurî, Beko û Nûjîn jî derketin û berên xwe dane malê.

Di rê de Beko di ber xwe de got:

- Bi rastî mamosta me zehf haş bû. Ma tu dibê wê çi bikine jê,

Gurî?

Gurî milên xwe hejandin:

- Ez nizanîm.

- Ma ew jinan jî dbcin hepsê? Nûjîn pirsî.

Beko bersiva Nûjîn da:

- Erê, ew jinan jî dbcin hepsê. Ji bo pirtûkeke kurdî ev saleke cîrana me ye ku di hepsê de ye. Carekê polîsan kirî lawikê cîranê me jî bigirta lê bavê min nehişt.

Nûjîn:

- Ma ew jin û mêran dbdne ba hev?

- Ew wan carina dbcine ba hev, carina jî ji hev vediqetînin, Beko got.

167

Beko baş bi vê yeka han nizanîbû, lê mîna ku ew bi her tiştî bizanibe bersiv dida. Ev toreyek wî ya kevin bû. Berê hinekan tiştekan jê bipirsiya, wî zanîbûya nizanîbûya, rasterast bersiv dida. Wî pirê caran

bersivên şaş û ne rast didan. Ku hinek zarok li hember bersivên wî derketina, zora wî di zarokan de biçûya, li wan dixsit, ger zora wî di wan de neçûya, digiriya û digot:

- Ez ê ji bavê xwe re bibêjim.

Piştî hevnasîna wî û Gurî, Beko bû Bekoyekî din. Gdek guhertinên baş tê de çêbûbûn. Berê hema hema peyva rast ji devê wî dervediket û her derew dikir. Lê niha pir kêr derew dikir. Wî berê bi tu zarokan re nikanîbû hevaltî bikira, niha ji bilî Gurî zêdeyî deh hevalên wî hebûn. Di gel van guhertinan jî dîsan Gurî jê ne xweş bû. Ji ber ku hindik bûya jî dîsan wî derew dikir.

Di rê de Gurî ji Beko pirsî:

- Beko, ma tu tu caran hatiya girtin lo?

- Ez?. . . Ee. . . No, ez nehatime girtin.

- Ma tu hatiya girtin?

-No.

Nûjîn ji Gurî pirsî:

- Ma ne carekê bavê te hatibû girtin?

- No, ew cîranê me bû, Gurî got.

Piştî wê bi hefteyekê dîsan Gurî, Beko û Nûjîn ji dibistanê vegehiyan û bi hev re çûne mala Gurî. Lê kes li mala Gurî tunebû, ne diya wî li mal bû, ne jî bavê wî. . . Gurî û Beko pêlavên xwe ji pê kirin û derbasî ser mînderan bûn. Lê, Nûjîn derbasî hundur nebû, ew li ber derî, li ser lingan rawestiya:

Gurî jê pirsî:

- Çima tu derbas nabî, Nûjîn?

Nûjîn hebekî şermokî bû. Gava ew dipeyivî serê xwe dixist ber xwe, wê qet li çavên mirov nedinihêrî.

- Na, ez ê herime malê, wê bi şermokî got.

- Çima? Tu ê li mal çi bikî?

168

Nûjîn milên xwe hejandin û tu bersiv neda.

Beko henek pê kin

- Qey ew naxwaze tevî lawikan bileyize.

Nûjîn keniya, Gurî got:

- Bi rastî tu naxwazî tevî lawikan bileyizî?

- Bdê, ma kê gotiye ez naxwazim?

Hîn wilo, diya Gurî kete hundur. Gava ew wilo çav li Nûjîn ket, wê bi devkenî jê pirsî:

- Çima tu li wir rawestiyayî keça min? Derbas bibe, rûne.

- Na amojnê, ez ê herime malê.

- De de, tu jî rûnê û tevî Gurî û Beko pariyek nan bixwe.

Bi qasî ku diya Gurî ji Gurî hez dikir, ji hevalên wî jî hez dikir.

Ew, zimanê ku bi Gurî re dipeyvî, bi hevalên wî re jî dipeyvî. Ji ber vê yekê hevalên Gurî ji wê hez dikirin. Gava ew dihatin mala Gurî wan xwe li malê didîtin. Nemaze Beko... Tew mirov digot qey Beko bûye lawê malê. Roja ku ew neçûya mala Gurî tunebû. Tew carina, gava şev dereng dibû, ew li mala Gurî radiza.

Diya Gurî ji wan re çend îsot û çend bacan di tawê de sor kirin û anî danî ber wan.

Pêşî Nûjîn nexwest bbcwe, lê diya Gurî jê re got:

- Çima tu naxwî keça min? Were tu jî du pariyan bixwe.

Hingî ew jî bi wan re rûnişt û hêdî hêdî xwar.

Diya gurî ji wan pirsî:

- Ma wê heya kengî mekteba we girtî be? Ma qey ew hew vedibe?

Gurî:

- Mamosta me jî bi mamostên din re hatiye girtin. Heya ew neyê

berdan wê mekteba me girtî be, got.

Beko jî bi ser ve zêde kir û got:

- Ez bawer nakim saleke din jî mekteba me vebe.

Beko bi du-sê mehan ji Gurî biçûktir bû. Lê ew ji Gurî dirêjtir û bi navmiltir bû. Porê wî zer, çavên wî mezin û şîn bûn. Carina rabûn û rûniştina wî weke ya mezinan bû, carina jî dibû weke zaro-
169

kên çar pênc salî. Ew li gorî rewşê dihate guhertin.

Wan di ser xwarinê de qala hevaleyê xwe dikirin. Hema ku ew ji xwarinê vekşyan, ew hevalê wan kete hundur. Gava lawik kete hundur, Gurî got:

- Binêre, mêrên çê wilo bi ser navê xwe de tê.

Piştî ku lawik rûnişt, Gurî jê pirsî:

- Ma tu ne birçî yî?

- Na, spas.

- Kuro ger tu birçî bî, bbcwe.

Lêwîk du-sê parî li wê xwarina li erdê xist û ji sifrê vekşiya. Piştî ku ew ji sifrê vekşiya û destên xwe bi pêsgîra nîvşil pak kir, ji Gurî pirsî:

- Min bihîst wê Walî were vir û we gotiye, hûn ê li hemberî wî bimeşin, ma rast e?

Beko li çavên Gurî mêze kir.

Gurîjilêwikpirsî:

- Kê got?

- Ev du roj in li mektebê her kes li ser dipeyivin. Hema hema her kes pê hesiyane. Ji midûr bigire, heya bi sinifa yekê.

- Mamoste jî pê hesiyane?

- Erê, erê, ew jî pê hesiyane.

- Midûr jî?

- Erê, giş, giş. . . Lê midûr pir hêrs bûye. Ew dibêje zarokên ku vê yeka han bikin, ez ê wan ji mektebê biavêjim.

Gurî serê xwe kil kir, Nûjîn hebekî tirsiya; lêwik domand:

- Midûr li hemû sinifan geriya û ji hemû zarokan re got, ku ew tiştekî wilo bikin, ew ê ji mektebê bêne avêtin. Lê gava midûr piştî xwe dida zarokan, zarokan gişan bi ya xwe dikirin û digotin ku ew ê li hemberî Walî bimeşin.

Beko ji lêwik pirsî:

- Ê baş e, ma ew nabêjin, kî dê vê yekê bikin?

- Çawa nabêjin?

170

Li çavên Gurî nihêrî:

Dibêjin, bi alîkariya xwendevanên lîseyê, dê Gurî vê bike. Midûr digot ku ew bi dest min bikeve, ez ê serê wî ji nava milên wî hilqitînim, ez nahêlim êdî lingên wî bi hewşa vê mektebê bibin. Ew çi dike bila bike, ji xwe ev nêzîkî salekê ye ku mekteba me girtî ye û mamosta tunene. Ger ew wilo dibêje, çima ew ji me re mamostan peyda nake.

Di wê navberê de diya Gurî di gel kincên şuştî kete hundur. Gava wê bihîst ku ew behsa dibistan û mamostan dikan, ji lêwik pirsî:

Ma dersdarê we jî hatiye girtin, bavo?

Na, jinapê, ew nehatiye girtin, lê weke ku ew jî girtî be, rojekê mekteb heye, deh rojan tuneye.

Nûjîn mamosta xwe bi bîr anîbû:

Jinapê, Welleh mamosta me pir baş bû. Wê pir ji me hez dikir.

Beko xwe avête navê:

Ji ber ku ew jin bû, wê ji te hez dikir. Çima wê ji min hez nedikir?

Ger tu baş bûya, ew ê ji te jî hez bikira. Piştî hatina Gurî wê ji te jî hez kir. Tu berê qet nebas bûyî. Min jî ji te hez nedikir, ez ji te diqeherîm.

Ew heya saet sisê piştî nîvro li mala Gurî man. Dû re ew rabûn çûn mala hin hevalên xwe, yên din. Lê, Nûjîn bi wan re neçû, wê xatir ji wan xwest û çû malê.

Gurî di gd neh-deh hevalên xwe yên sinifê û çend şagirtên lîseyê heya bi derengê şevê li ser meşa li dijî Walî ya ji bo berdana mamostan munaqêşe kirin. Wan bi boyaxa sor li ser cawên spî hin nivîs nivîsandin: "Mamostê me berdîn!", "Em mamostê xwe dbcwazin!" û bi tîpên hûr jî di bin wan nivîsan de "Serîhildana Zarokan" nivîsandin.

Ew sibehê zû, bi rohilat re, di gel wan cawên xwe çûne hewşa dibistanê. Hîn tu kes nehatibûn; ne şagirt, ne jî mamoste. Lê bi tenê paqijkerên dibistanê hatibûn. Yek ji paqijkerên dibistanê pîrejineke 171

qelew bû. Gava ew çav li zarokan ket, wê melkes û paçikê di destên xwe de danîn, hate ba wan û ji wan pirsî:

- Ma haya we jê heye, ku wê îro Walî were û li mekteban bigere?

Gurî:

- Erê, em dizanin, got.

- Ger hûn dizanin çima we kincên xwe yên mektebê li xwe nekirine?

Ma Walî we di vê rewşê de bibîne ew ê nebêje çî?

Beko destên xwe xistin bêrîkên pantorê xwe û bi du gavan bi pêş de hat:

- îro tu zarok nayên mektebê, em ê li hemberî Walî bimqin.

Jinika xizmetkar:

- Çii?. . . Hûn îro nayên mektebê?

- îro tu zarok nayên mektebê, Gurî jî bi dengekî hebekî nizim got.

Jinikê wa bi ecêbmayî jê pirsî:

- Hûn çawa nayên mektebê kuro?

- Em nayên, Beko got. Heya ew ji me re mamostan peyda nekin û mamostê me bernedin, tu zarok nayên mektebê.

Jinik hew bi wan re peyivî. Bi niyeta ku wê Walî were dibistanê, ber bi satila xwe ya avê çû û dest bi paqijkirina xwe kirin.

Ew zarok heya bi vebûna dibistanê li hewşa dibistanê rawestiyan. Hêdî hêdî kîjan zarokên ku hatin jî xwe li wan girtin. Hin zarokên din jî li ser cawên spî nivîsandibûn. Wan hemû tiştên xwe yên ku nivîsandibûn, spartin hewşa dibistanê û xwe jê re kirin talde da ku midûr û hin mamoste nebînin.

Gava li zengil kêt û mamoste ketin hundurê sinifan, sinif hemû vikîvala bûn. Hingî hin mamoste ecêbmayî man û di dilê xwe de gotin: " îro ne şemî be?" Lê tu zarok neketin dersan. Hemû li dora Gurî û hevalên wî kom bûbûn. Di wê navberê de xortekî bejinkurt, ku ji simêlê wî devê wî xuya nedikir, li wir xuya bû. Ew xort ber bi Gurî çû, hêdî destê xwe li milê wî xist, ew kişande qorzîkekê, bi dizî tiştin jê re gotin, rojnameyeke du pelo dayê û bi riya xwe de çû.

172

Saet li dor yekê nîvro, tirimpda Walî di gel neh-deh tirimpdên din bi tîtetît di sûkê re derbas bûn û ber bi sarayê ve çûn. Lê çer ku ew derbas bûn, zarok weke kuliyan li sûkê peyda bûn. Hema hema zarokên hemû sinifan li hev civiyabûn. Di wê deqîqê de te bi ku de gava xwe biavêta zarok bûn. Zarokên dibistanên din jî ji bo meşê derketibûn bajêr. Mirov tu caran bawer nedikir, ku wê ewqas zarok li bajêr hebin. Li bajêr tu caran tiştên wilo nebûbûn. Mezinên ku

çav li wan diketin, şikin dikirin, tiştin ji hev dipirsîn û bi riya xwe de diçûn. Sûk seranser tijî zarok bûbû. Carina gişan bi dengê û bi hev re bang dikirin " Mamostê berdîn! Me mamostên xwe divên!" Dengê wan bajar dixiste bin saw û tirsê, pirça xortan li wan gij dikirin, leşker û polîsên bajêr ditirsandin û cih li Walî teng dikir. Zarok bi xwe jî bi dengê xwe hêrs dibûn, bi xurtî û bi êrîşî ber bi sarayê ve dimeşyan. Lê berî ku ew bigihîjin ba sarayê bi panzdeh-bîst gavan, leşker û polîs di pêşiya wan de rabûn, bi dar û qamçiyên pirên wan ji hev belav kirin. Dû re wan bi hewa de sîlah berdan. Hingî bajar li nav guhê hev ket. Her zarokêkî bi cihekî de baz da. Teqereq, qîj û wîj, hewar û gaziye kelkela germê dida ji bîr kirin. Mezinên ku ji sibehan heta bi êvaran li çayxanan rûdiniştin, rabûn ser xwe, yê ku xwe bi dizî gihandin malên xwe û yê ku xwe di quncikên dikanan de veşartin. Lê Gurî, Beko û hevalên xwe nereviyan. Ew her ber bi sarayê ve dimeşyan û bang dikirin: " Mamostên me berdîn! Me mamostên xwe divên! Hîn wilo darek li paş stûyê Gurî ket; yekî din û yekî din... Gurî şewişî û li erdê ket. Wilo, çend dar li Beko û zarokên din jî ketin. Leşker û polîsan Gurî, Beko û bîst-sî zarokên din jî girtin û ew avêtin tirimpêlên xwe. Gurî digel wan zarokan du rojan di bin çav de man. Roja sisiyan ku ew hatin berdan, wan dîsan bi alîkariya hin xwendevanên lîse, wan meşeke din jî çêkirin. Piştî meşa duda, mamostên wan hatin berdan û dibistanên wan vebûn. Lê Gurî di gd dersên xwe yê dibistanê bi pir tiştên din ve jî mijûl bû. Pirtûkên li ser stêrkan, yê dînî, yê li ser evînê, yê li ser

173

edebiyatê; hema çî têteta destên wî, wî dixwend. Wî di hundurê demeke kurt de, ji bilî tirkî û kurdî xwe hînî erebî jî kir. Piştî ku wî

mewlûda kurdî ji ber kir, dest bi nivîsandina helbestan kir. Pêşî bi tirkî, dû re jî bi kurdî nivîsand. Dawî dawî, wî bi hemû hêza xwe, xwe da siyasetê. Ji ber vê yekê ew mecbûr ma ku wdatê xwe terk bike û derkeve derveyî welêt. Ew pêşî li welatên ereban, dû re jî li Ewrûpayê bi cih û war bû.

A va ye; niha jî ew bi bîst saliya xwe, li serbajarê Swêdê, li Stockholmê, di xaniyê xwe yê xalî de rûniştiye û serpêhatiya xwe dinivîsîne.

174

WEŞANÊN NÛDEME

> BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ Celadet Bedir-Xan / Gramer

DÊ Û DÊMARÎ Egîdê Xudo / Roman

KESKESOR Nûredîn Zaza/Çîrok

DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn

HÊZ CI BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Essay (Ceribandin)

MÎRZA MEHEME Medenî Ferho / Roman

> MILKÊ EVÎNÊ Rojen Bamas / Şiîr

BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Hesên / Roman

SEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî/Roman

MISK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî/Roman

BEXÇEYÊ VÎSNE Çexov Werger: Rrat Cewerî / Piyes

LI BENDA GODOT Samuel Beckett Werger: F'rat Cewerî/Piyes

GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Firat Cewerî / Aforisma

GIRTÎ Firat Cewerî/ Çîrok

KEVOKA SPÎ Firat Cewerî/ Çîrok

Çîrokên di vê plrtClkê de di des(pêkî salên 80'ê de

haane nivîsandin ci piraniya wan di kovarên wan salan

de hatJne weşandin. Mîna plrtûk Jî di sala 1986'an de

derket. Demeke dirêJ di ser nivîsandin û çapkîrîna van

çîrokan re derbas bClıye; Lêbelê bClıyerên çîrokan, rewşa zarokên kurdan, rewşa welêt, ars cl zılma leşkeran hê Jî berdewam e.

Gava ez berî niha bı çend salan seriyekî çClıbClım welêt û mın rewşa welêt bı çavên y;we dîn bû, mın Jı nû ve çapkırına van çîrokan p y;we re mîna berpırsıyariyekê dît. Dıgel ku nêrîna mın ya dı derheqa forma çîrokê de hanyê guherun Jî, dîsan ez bawer nakım ku ez ê îro bıkanıbım bıgıhîpm zımanê van çîrokan, germahıya wan, pdılıya wan. Firat Cewerî

**

GOPALÊ SOR

MEŞAL TEMO

- Çîrok -

Weşanên Taybet yên Kovara

MEHNAME

© Rezber 2003

Meşal Temo

û MEHNAME

MEŞAL TEMO

1

NAVEROK

– Diyarî 3

– Pêşgotin 4

1 – Kopalê Sor 9

2 – Roja Evînê 12

3 – Navlingên Şalik 17

4 – Kihêla Toz Bi Ser ketî 22

5 – Min Çi Bi Serê Xwe Kir? 27

6 – Dem, Dîwar û Nimre 30

7 – Bêsînor sînor e 33

8 – Yasemîn 38

9 – Kûpên Hemdem 43

10 – Rewrewk û Çav 48

11 – Kişwera Xirnikan 51

12 – Zimanê Dalqiyayî 54

2

Diyarî

.... Ji Bo

Her Şeş Gulên Jiyana Min Re..

Û

... Ji Bo

Dayika Gulan Re

Ya Ku Hevpariya Temenê Min Kirye.

3

Pêşgotin

Ciwanê ABDAL

I

Her wê çîrok bimîne yektirîn çarçova hunerî û çandî ku dem û cih bi xwe saz dike, ya ku kes û bûyerên, an naveroka babetên ji çarçoveke biçûk dixwe zayînek tevayî, wekî kesin qehreman bi zayîneke nû diafirîne, ya rast ew kes bi xwe jî hîlbijartîne ji jîneke rojane, û ji wekheviya bûyeran rojane, himberî helkewt û ramananên demên bûrî rengereng dikin.

Ku ji bona siruştê jînê bide xuyakirin bi asoyên bilind û bi çend keskesorên celeba; civakî, abûrî, sêyasî û çandî..hd, bi nêrxî dide xuyan jiyana ku van kesan dijîyan bi hest û hizrên xwe, bi bawerî û nêrînên xwe, himberî êş û

hêviyan beravêtî û nûjin peqîn ji sedema bûyerên kevnare, ya xweş dide berçavkirin ew sinc û rengên mirovên berxwedanê dikirin, li demekê di navbera du kevalên civakî de, çaxa berfirehbû suruşta jînê bi hev re dikeliyan.

Belê.. lê mirov nekare derbasbe bê ku nebêje /şirove û lêhildan/ bo ramanên felsefî û bendên civakî yên di bingeha karê hunera nivîsî de, bi dema xwey kevn û nuh de, ya rol û bandora xwe bê cudahî li du hev li derdora xwe fikir, yê pêşîn akama xwe li nivîskar fikir û ya paşîn li xwendevanan fikir, û bi xwe evin herdu yên bingehînin di

4

raz û diyaroka çîrokê de, ku bi evînî jî pê mijûlin û çawa rapêçayîne raz û rava dibin, bo rahêjin wateya perestiyê û bo rêza sinceke teybet bi cih bînin, an jî hilgavtineke şoreşî bikin dijî şopemayên kirêt û wan hilînin ji holê.

Wisa ye mebest.. ku mirov dikare tiştên di hundirê sewdan de dikelin ji kul û derda bide xuya kirin, ji ber her yek ji kuncika ronahiya cihanî dibîne ku pê hevpare, bi giyanekî çelengî digere li xelasbûna xweyî dunyayî! Ev badîhewa hebûnê bi zorê ye ne bi kêfa mirove, ku çawa wê karibe bireve ji helkewteke kirêt û ji stema civak û abûriya zemkirî û him jî ji bêçareyên teng.. çendek vajîhevan dijî wî hatin.. bo hêvî û baweriyên wî beravêtî bikin.

Belkî nivîskar di bin bandora şeweya pêlek çarçov de renga'reng dikare kesên xweyî lehengî ji tûnebûna xwe amade bike, ji xwebera xwe destpê dike an ji serpêhatîyên kesayetî ya xweyî çarçovkirî bi bîranîn û rêbûriyê pêre bûne an li derdora wî bûne.. peyda dike, û wisa bi hevokêk hemereng ji nêrîna kesatiya xwe li mebesta bûyeran dinêre.. berî her tiştî dibe lehengê çîroka xwe be, û bi şirovekirina xweyî xweberî di navbera pêlê derya gotebêjên xêz û rêzên naveroka çîrokê de kuta dibe.

5

II

Û çîrok têtê nasîn bi hemerengê xweyî normal, ya bi şêwa pêşîn û dawînê ve, û bi hunereke hûnandî ku ji-nişkave biteqe li dawiya despêka xwe ve yekta bibe cuda, û bi peyvin hindik û zimanekî zelal mîna nemûnake bi hest û helbest hunandî, ku zimanekê tevayî kurdistanê an zimanekê Standerd tune ye, lê zimanekê hergav û dem li herwar û kişwerê pêdibe. Weke têtê zanîn ku kurteçîrok hene bi çend şêweyan têne nivîsandin, çi ji hêla kûrbûna mebestan.. çi ji hêla firehbûna asoyan, lê ev çend şêwe meriv nikare girêde bi xwe ve heta dawî yê.. ew têtê nivîsîn bi zimanê bernavê xweberî; ezîtî~peyv.. an bi zimanê bernavê; ewî~peyv, bê ku nivîsandin bi celebê hûnandinê li navbera durust û sîweran de bişkê di naveroka helkewt û xeyalê de.

Belê.. Bi kurtî çêrok bûyerek ezîtiye û her lehengek çîrokî li himber wî kesekî rastî heye dijî, û ew leheng parçê duyeme ji siya xwedanê xwe ye, an jî hilgirtiyê tovên bîranîna bûyerek kirinê ye, an jî ji hizr û ramanê mînakî hatiye afrandin. Lê ev raz û zêwa carna pê têtê nivîsandin.. rasteqîna bazdanek ezitiyeke nêzîke ji nivîskar.. mîna rêbûrînên bi serê wî de hatibin.

Û wekî çîrok pirê caran li bingeha gotekêye, bi gotek bûyî xwe avadike, lê pirê caran jî li ser razek lêhildayî xwe avadike.. û ev pêkanîna raza di karê wêjê û hunerê de pir

6

pêk têtê, lewma ji sedema pir tiştan mirov naxwaze zûzû rewa û eşkere bike. Ji xwe pêdeviya hunerî û afirandî ku vekirî be li ser pir asoyên guftûgoyên bê~dawî.. Htd.

III

Wisa.. bi pirsekê; Ta çi radiyê nivîskar û çîrokvan Meşal TEMO di vê pirtûka çîrokan de ya bi navê “Gopalê Sor”, bingehên çîrokî bi temamî saz kiriye, ango wê saz û bendên çîrokan bi cih anî ye.

Ya rast di nêrîna min de, wî navdarî M. TEMO tu kêmanî nekiriye, lê belê.. zêdekiriye, gava ev çendek çîrokên xwe bi hûnereke afirandêr û bi raz û zêwek giranbuha rêzkiriye, û bi hûnereke çak van kesên bêkes di ristina çîrokên xwe de ava kiriye, mîna xirinkan û kûpan û dem û dîwar, sînor, û zimanan..htd, di peşên dawî de ji pirtûka xwe navdar de, ji xwe ev zêdebûneke di kurteçîroka Kurdî de ye.

Û weke diyare jî ku çawa gava dest bi rist û hunandinê dike bi zimanê hin leheng û qehremanên çîrokê.. dide xuyanêkirin zor û sitema dagirkeran ya li ser kesanê wî bûne, çi lêdan û eskenc û girtin be, û çi biyanîbûn û tûnebûn û qedexekirina gel û ziman û dîrok be, ku her gav li gasîna welat pê dihisin û bi zîyan dijîn. Û ya zêde çîrokan xweş dike ew peyv û goftûgoyên rengîn an diyalogên resnî di babeta naveroka çîrokan de. Ew diyaloga ku leheng weke hizr û ramana pêdikin.. bi bawerîk helkewtî û bi zimanekî

7

xemilandî û rapêçayî bi hest û helbestî, ya ku dibe pirinsîb û raza serdana nivîsandinê.

Bi rastî ev gava ku nivîskar M. TEMO avêtiye yektirîn ji hezar gavên riya dirêj e, di riya wêje û çanda kurte-çîroka Kurdî de.

8

GOPALÊ SOR

Kalemêrekî pişt xwar, sal û demên dirêj li ser enîya wî de hatibûn kolan, dest û ling dilerizîn lê bi dest pelandina dîwaran hêdî hêdî bi rêve diçû. Ji

nişkêve derbasbû gulfiroşgehek û qevdeke gulên yasemîn kirî û riya xwe berdewam kir.

Dimeşîya can di tûtihi, hema bi zor bejna xwe rast dikir. Dema gopalê wî hebû xwe dida ser û pê dimeşîya, lê çibeke ji vê demê re, dema bêdengîyê ye! Dema dev girtinê ye! Dema kirîn û firotinê ye! Hemo tişt tê de hene bilî mirovantiyê! Lewra gopalê wî weke laweke wî bû. Ew gopalê Ko kurî wî mezî jêre diyar kirbû, gava xwendina xwe tamam kir û ji wellatê biyaniyê vegeyabû, wê gavê kurê wî E'î jêre got:

- Fermo bavo diyariya min ji tere gopalekî sor ji bo sipartina salan? Çimkî guhertin pirin di wellatê leşker û parastinê de!

Bi vê gotinê wêneya girtina E'î dihat ber çavên wî, berî çardeh salan di elinda şeveke tarî de hatin wî birin. Wê demê gelekî westiyabû ko nas bike di kîşan girtîgehê deye! Lê nikarîbû ji ber diçû ku jê re digotin:

- Here tu kes bi vî navî li ceme nine? 9

Ji wê rojê û pêve rewşa wî zehmetir û diwartir dibû, nemaze piştî di berbanga rojekê berî heyşt salan de, hatin kurê wî Hesên birin û piştî wîna re bi du salan kurê wî Husên jî di niv rojekê di orta paytextê de girtin, û berî salekê kurê wî Welî ji zanîngehê ew jî girtin û birin!?

Çar lawbûn, tevde di girtîngehê de ne. Dayika reben nikarîbû di bin van rewşan de jiyana xwe berdewam bikra, temenê xwe da û çû dilovaniya xwe.

Kalemêr û gopalê xwe tenê man. Lê belê parçeke xak-biçûk jî hebû, ew firot bi nerxê wê li ber qapiyan gerîya, kaxezek ji vir û muhrek ji wir heta ku bi wan diravan gihaşt ber masa serokê parastinê, kesekê zik û ser mezî bû! Jê pirsî:

- E'î: Hesên: Husên: Welî: li cem we ne??!!

- Belê Li ceme ne, lê ev kes dijî şoreşêne û dixwazin bi zor destûrê biguherin û hunavê millet bi nivîsên xwe xeradikin, lewma em nikarin bihêlin tu wan bibîne!!!

Hema kalemêr bêdeng pêşde çû û gopalê xwe yê Sor danî ser masa wî û got:

10

- Fermo kurê min yê pêncan wî jî bibin cem her çar birayên wî!!?

Û li dû xwe vegeriya û ji hundir derket.

Kelemêr bi vî awayî dît ko li ber qapiyê goristangeheke mezine, yekser berê xwe da gora jina xwe û qevda gulê Yasemîn danî ser axa gorê û got:

- Serê min ji ber te bilinde dayika pênc lehingan... kurên te tevde bi mirovnî mêr bûn di demeke tu nerx ji mirovan re nîne?..

Qamişlo 1994

11

ROJA EVÎNÊ

Aştî bi keserek dirêj li wî dergehê mezin û hesinî nihêrt û bi dengeke bilind got:

- Ey dergehê bêbext, te çardeh sal ji temenê min di nav hesin û dîwarên xwe de qurmiçandin...! Îroj te li dûv xwe dihêlim weke cîh, lê bi wate.. tu ketî damar û mejiyê hestiyar..!

Aştî meşiya, ku peymaneke li xwe girtibû pêkbîne, heta ku hate girtin ew soz dabû mirovekî qencî pê kiribû û ew çend katan parast û bibû hogere wî di wê şeva tarî de. Gava giha bajêr raste-rast berê xwe da gulfiroşekî û guleke sor, mezin û bedew kirî û berê xwe da goristaneke bê gul û dar. Li ber gorekê rawestiya û bi nazî gul danî ser gorê û got:

- Vaye min gula sor ji te re anî. Li min bibûre ku tenê ez çardeh sal dereng mam! Lê tu zanî ku ji neçariyê bû.

Aştî bi axaftinên xwe re rewş û helkewta peymanê bi bîr tanî. Ji xwe rojek ji rojan ji bîra wî neçûbû. Ji ber ku ew rojeke taybet bû di jiyana wî de, roja girtina wî bû. Wisa tim wî bûyer bi xwe re hilgirtibû.

Bêdengî li gorê mêzand û bi destê yê çepê aliyek jê mizda, ew aliyê ku li teniştê wî xwe qurnisan dibû, bi

12

sar- serma wê kêliyê nedihisiya, hişê wî bi ber pêlên xeyalên wê şevê ketibû.

Hingê bi bazdan û helke-helk xwe bi vê gorê veşartibû û bi xwedanê gorê re bibû destbirak, ango çend kat ji axaftinê bi hev re şîrove kirin.

Aştî bi ponijandin ji hogirê xwe re got:

- Bawerim te min jibîr nekiriye.. ku mirov mirovan ji bîr nakin? Bûyera min û te dîrokeke giyanî ye, belkî tu pêşî ji gotinên min zivîr bû gava di wê dema ku ez hatim cem te. Hingî min bi nehes kêşand ji te re û bi xwe re diaxivîm.

Ew bûyer bi bêdengiya goristanê, xwe ji nû ve anî holê, di mejiyê Aştî de wêne kombûn û xwe bi gotinan raxistin.

- Kê go goristan tenê miriyan vedişêre, ma ne di civatên girtî de saxan jî vedişêre..!?

Aştî wisa bi xwe re diaxivî, ku di wê şeva tarî de çawa xwe li teniştê gorekî veşartibû, û her dengê kutana dilê wî tevî gurm-gurma dengê piyên polîsan dibû. Gava li pey wî dibezîyan û ew li nêzîkî goristanê reşê wî wendakirin.

13

Ji xwe di goristanê de dengê nû bi awaz lê zêde bû. Hilma sawa miriyan bi dengê zûrezûra çirçirkan û wîrqwîrqa beqan senfoniyeke azad û bextiyar diafirandin.

Aştî kêlîkekê bihna xwe berda û hindek hedarî li laşê wî geriya. Bi wê lerzanoka ku xwe li mijyê hestiyar rapêçayî bû, tebitî... Paşê serê xwe hilda, li derdora xwe nihêrt.

Gor bi tena xwe di wê tariyê de, û reşikên rûyê miriyên li ser rûyê dinê 'kêlikên' wan diyar dibûn di qadê de. Serê xwe hejand û di dilê xwe de got:

- Sipas ji we re gelî camêran, bi saya gorên we vê carê jî ji polîsan xelas bûm, tev ku ez gelek ji tariyê ditirsim, tarî min ditengijîne, bihna min teng dike, lê bawerkin gelî camêran tariya ku ez dibêjim ew tarî ne weke tariya we ye, cuda ye, tariyeke hemdem e, xwezî min karîba bixwenda ku ta kengê ji jiyane derketî, qene min ji te re bigota ku çiqas rengê tariyê pîrbûne.

Aştî li derdora xwe nêrî, hemû tişt bêdeng e, tenê bihna mirinê pozê wî dagirtiye. Bi destê xwe yê çepê dîwarê gorê mizda û axaftina xwe bi xwediye wê re dûmand:

- Belê ezbenî, tarî di civatên me de hemerengin, lê rastî ji te re bêjim ya herî dijwar tariya reweşt û wijdanê ye. Dibêjim tu bi şensî, heger tu ji zûve miribî belkî 14

bikaribim bêjim ji te re, ku di dema we de ev tariya hunav, tûne bû, rastî û wefedarî navnîşana mirovan bû.. Mala van reweştên rojhilatî xera bibe, hima darek an gulek di goristanên xwe de naçînin ku qene bihna bihiştê bihata ne bihna axa zûha tevlî tama mirinê bûye û şanikên laşê mirov tijî dike! Çavê min, de ka xwedê dilovaniya xwe li ser te bibarîne, gulek, beybûnek, şînayek li derdora te tûneye. Ma gelo hirmeta miriyan ne di bîranîna wan dene? Lê ne xeme çavê min... ji te re bêjim, hirmet ne ji saxan re heye û ne jî ji miriyan re! Diyare ku asîman û zemîn em jibîr kirine. Ji ber gelên wisa di tariya reweştê sincî de dijîn, hilbet wê bêtin jibîr kirin.

Bihnekî rawestiya, tabloya nav, bi piyê kûmlekê xwe paqîşkir, kolanên ku ew jî ketibû nav wêneyê li ser wî kevirî xweya dikirin.

Bi dest pelandinê dixwest ku binase navê xwedanê vê gorê çiyê, bi wê mizdanê jê re diyarbû ku nav kurte, lê tirs û sawa di laşê wî de digeriya ne dihişt ku bikaribe kêsima tîpan binase, çimkî bûyera bazdana ji polîsan kêsîm, reng û awayên tîpan di hestên wî de tevlihev kiribûn, lewma xwest binase ka roj-dema mirinê kengî bû, ew jî kir nekir bi serneket ku fêr bibe ka kengî bû.

15

Li xwe zîvirî û kesereke kûr kişand û berê xwe ber bi sorbûna tîrêjên elinda ve da û pê re axaftina xwe bi xwedanê gorê re domand:

- Parastvanê min, tu zanî ku ev elinda ya roja cejna Falantayên e, bawerim ku di dema wê de, we guh ne dida van tiştan, ango ev cejn ya evîne ye, tê de diyarîn ku evîndar têne pêşkêş kirin, keç û xort gulên sor diyarî hev dikin û soz û peymanan bi hev re datînin. De ka ez û te jî peymanek bi hev re deynin. Bawerke ku ez îroj xelasbim ji destê van pêxwasan, illem ez ê ji te re guleke sor bînim û bi te re demekê jî şahiya cejna evîne biborînim!

Kêlîkek derbasbû û pêre ronîya rojê xuristiya zemîne da nîşan, digel wan goristanan û bê lebata wan, hewesek xurt Aştî dagir kiribû û nema hişê wî man li ser nasandina navê xwedanê gorê. Wê hewesa wî hişt ku karibe dev ji haydariya xwe berde û li ser piyan bisekine ji bo nav bixwîne.

Hingî di dema nav xwend, dît ku gora mirî ya jinek dî ye, ji xwe dema ku Aştî nav bi lêvkir, destên wî bi teq teqa zincîran hatin girêdan û komek ji polîsan lingên wî bi hewa xistin. Di wê kefteleftê de Aştî serê xwe zîvirand û bi bangek her di çû kêmbû got:

- Xaltîka Fato li hêviya min bimîne..!, di ahinga cejna evîne de, ezê gula sor ji te re bînim!..

1/10/2002, Qamişlo 16

NAVLINGÊN ŞALIK

Diyarî bo Bavê Wilyam

Li wê oda fireh û dirêj diçû û dihat, di navbera du gavan de çoga xwe ya rastê difistiqand, herdû dest li paş piştta xwe dilerizand û bê ku li min binêre digot:

- Em dizanin hûn çi dikin û çi dinvîsin! Heger serê te hişk be me serê hişktire şikandiye, Heger rika te hişkbe em bêtir tunderikin! Serê mezin li ceme tune, tev bi kontrol di meşin û bi hayê me diçin û tên! Binêre em dikarin kilîta zimanê te vekin, an jî te bikin cendek û ji xwe sed bijîjik hene ku binvîsin mirineke xuristî ye?.

Min di koşeyekê sekinandibûn û ji xwe alavên oda wî û qenepên tê de û tabloyên wênan li dîwaran û xalîcên raxistî, te di go belkî serokê komarekê ye!.

Lewra min di bin çavan temaşe dikirê wî efserî jî gotinê xwe dikir bi ezberbûn, çimkî bawerim ji sedan re gotiye û dubare kiriye, loma jî bê rawestandî gotinê xwe berdewam dikir bo ku zû ji riwê min xelas be..!

Li zengil xist û ji notirvanê xwe re got bila here!! Êvarê were?

Êvarî ez xistim odak biçûk du sê sandeliyê bê pişt lê avêtibûn ta ku serokê wê hûba kambax vala bibûya,

17

çimkî mêvanê wî hebûn, diyarbû ku ew ode a dervan û çayvan bû, ew jî kesekî ji gundê me bû li wir ji zûve dixebitiya, çay çêdikir... û him jî ode û eywan paqij dikir!

Birastî min gelek caran ew karmendê çayê didît, lê min nedixwest rastî wî bêm an silavê jî lê bikim, çimkî navê wî bi nerindiyê bela bibû.

Ji bê çarebûn û dirêjiya dema bendewariyê... hişt ku vê re biaxifim!

- Xaço rewşa te çewa ye?!

- Mamoste dibûre..!

- Diyare tu bêyî dilê xwe dibêje?

- Her yek jana wî li gor wî ye..!

- Tiştê dizanim li va dera kêf kêfa te ye û Ango raste tu çayvanî, lê kelîja te di gunde... ne kêrî serokê te ye?

- Tu çêra demek gelek kevin dikî û hingî xelkên me şerm dikirin werin fermangehên parastinê! Lê tev ku bîrweriya min li gor min e, bawerim ku şermî jî hate guhertin!

Min bi serhejandinê erêbûna xwe da xuya kirin, ji ber ew diştexilya û ramanê min li cem efser kû kengî ji vê estengê xelasbim, lê li ber çavbû ku ew çayvan jî dixwest derdên xwe bêje û hinkî xwe vehesîne, diyarbû ku dabû dilê wî û divabû derbe? 18

Lewra bi serhejandinê min alîkariya axaftina wî dikir!

- Mamoste kulê min ji yê we girantirin! Ne ji zûve ye bûme karmendê vê fermangehê, ji tunebûna derfetên kar û neçariya abûrî? Ji xwe di destpêkê min du, sê, mûçeyan (heyvane) distandin ji çayçêkirinê û ji paqîşkirinê re û yek heba jî ji guhmîçkirinê re û Ango min guhdarî gotinê xelkê dikir û tanî ji efser re û Ev derfet nuha hate girtin, çimkî guhmîç pirbûn û nûçeyê tînim bê sûdeye li himber raporê riwê lihêfên ew tînin?

- Wisa payebilind in?

- Mala vî gundî xera bibe, di van salên dawî de êdî debarî tê de nemaye? Binêre Mamoste li xelkên me, bi çanda kincên Ereban xwe qure dikin û di van salên dawî de nema bi fistan û destmal û E'gal¹ qayil dibin! Lê di bin çekan de çekê sipî ê ji Ereban hatî li xwe dikin û hinkî ew dirêj dikin bi erdê ve dixişeqe? Ji xwe bêkarin û her li cem efser rûniştîne û çêrê hevdû dikin? Bawer ke, Mamoste, çêrê jinên xwe jî dikin, ma kes çêra navlivêna xwe dike?

- Ango gelek pera li ser distînin..wilo?

- Çi pera distînin? Nûkir û sêxura xwe dikin û pera jî di ser de didin? Sûdeya wan tenê çaya didim wane? Mamoste oda efser vala nabe, ji şalik² û destmal û fistan renga rengin û

19

ûtîkirîne, tev xwe axa û mixtar jî dehesibînin?? Tu wan li hundir bibîne bê çi pesindar û boyaxçîne?? Dikevin pêşbirkê kî bêtir nûkirî û pera bide ku bikaribe nêzîkî efser bibe?

- Tu gelekî bi hêrsî di derbarê wan de?.

- Ez bê kar hiştim! Helbet wê kîna min pir be? Ma tu bi xwedê kî ev karê nerind jî ji dest me nûkiran derxistin?.

- Rizqê te li xwedê! Va hîn tu paqîşkirinê û çayê dike.

- Ew jî ji dest min derxistin?.

- Ma ode û eywanê jî paqîş dikin?.

- Ne xwe fistan û şalikên xwe çima dirêj kirine? Di ser erdê re dixîştin toz û gemarê jî bi xwe re radikin? Efser jî nema bi hewceyî mine ku ez paqîş bikim?

- De va tu çayê çêdike?

- Ne ji xwe ezê birevim berî ku ev kar jî here? Bawerim di pêşeroj de wê çaya xwe jî bi xwe re bînin? Binêre vaye ji êvarî de tu hatiye û efser te derbas nake, ma ne çendek ji maqûlên³ kûnikan li cem rûniştîne? Hingî bê karin yan qelew û zikmezin dibin an jî dirêj û bê qat dimînin?

20

Bi gotina dawî ve zengil lêda û bi lez Xaço derbasî oda efser bû, kêliyekî kurt vegeriya û ji min re got:

- Dibêje bila sipê vegere, ez nuha ne vala me?.

Qamişlo 9/3/2002

Têbînî:

- E'gal ji rîs çêdibe datînin ser serê xwe û bi xwe di paşeroj de bapîrên Ereban lingên devan pê girêdidan.
- Şalik Ji rîs an ji hiriye çêdibe pêşiya wê vekirye, Ereba davêjin ser milên xwe.
- Maqûl gotinek Kurdî ye ji meznê malbatan an ji berpîrsên şaxên êlan re tê gotin. Ji xwe kûnik yê Mitriba ne ango gotin bi wateya erzanbûna wan kesan tê?

21

KIHÊLA

TOZ BI SER KETÎ

Piştê xûz û lingên lerizî di cadê de, hema dileqiya tenê xişt-xişt sol şimika di piyan de dida hisandin ku ev kalemêr dimeşe! Pêre jî koxikek ziwa weke vedengek ji teqîna lîngan di wê siba zelal de, di navbera herdu dangan jî gûmêna dilekî stewiya yê dihat!

Reşo serê xwe bi destmalekê pêçabû û kûrkek hirî avêtibû ser milê xwe, ew di bin giraniya wî de bêtir xûz bibû, vê sibehê bi tîrêjên rojê re ji mal derketî ji neçariya êşa sînga xwe, ev êşa ku her zivistan ew difetisand, lewra vê siba han berê xwe da bijîşkên Qamişlokê.

Di her gavekê de afir û nîfir fikir û bi dengê bilind ji xwe re diaxivî û digot:

- Ma qey ev bajarê Dirbêsiyê pêşve nare, xelkên wê hayê wan ji bayê felekê tineye, tenê Torbîto dere Qamişlo? Belkî ev maldar bi otobûsan û turinbêlan nehisiyane? Divê sibê zû here û êvarê yan vegere yan jî di orta rê de xera bibe?

Reşo kalemêrek hişmend û dewlemend bû, lê gundê xwe tev firotin û li kêfxweşiya xwe li Bêrûtê û Şamê

22

danî? Ji wê yekê jî xaniyek li bajêr pêydakir û rojên xîzaniya xwe lê dibûrîne û dema xwe bêtir li çayxanê diqedîne.

Di van raman û xeyalan de hema gihaşt ber Torbîto, lê dengê tengezar bang dikir:

- Reşo Reşo?

Reşo bêdeng serê xwe hilda dît ku destbirakê wî Remo ye, çûn lep û rûyên hev, diyarbû ku Remo jî dere Qamişlo, li teniştê hev siwarbûn çimkî ev bîst salbûn ku hevdû nedîtibûn, loma jî bi kêfxweşî li rewş û demên hevdû pirsîn.

- Reşo hêvî dikim ku jiyana te xweş û şadbe.

- Baş e, Remo, diyar e tu hîn xurtî û pora te jî reş e, tayek jî jê sipî nebûye.

- Temenê min şêst û pênc sale, lê bawerke ta nuha ez bi tu êşê ne ketime.

- Dana xwedê ye ezbenî.

Torbîto bi rê ket û ta Qamişlo bi kêmanî du demjimêr hene tev ku heta bajarê Amûdê 26 km û bi tevayî 60 km, lê rê nexweşe û bazadan jî li gor Torbîto ye, dem

23

pire û axaftin jî pire di nav herdû dostan de û hema Torbîto ji bajêr derket Remo got:

- Reşo kuxêna te pire û ziwa ye.

- Van cixarên titûna Xursê ez kuştim.

- Xirxir ji sînga te tê, mirov dibêje qey tiştê di hundirê te de sax nema ye.

- Ma be, nema be, malê min eve! Ka bêje tu çi dikî?

- Bi xwedê ez li gundim her roj radibim limêja sibehê dikim û hinekî ji xwedê re dixwînim, û derdikevim ser dika ber derê oda mêvanan rudinê û Sorbelekê tînim bîra xwe.

- Sorbelekê kî ye?

- Wêêê... ma nayê bîra te? Sorbelekê kihêla min a hespê xortaniyê ye.

- Piştî sî û şeş salan hîn tê bîra te?
 - Reşo ma kihêl weke wê hebû! Tê bîra te gava şerê me bi êla Begaran a Erebi re, (ev şer di 1944an de di navbera Kîkan û Begaran çêbû û bi encama wê Kurd bi serketin) kihêlê çi dikir? 24
 - Xwedê ji te razî be! Dev ji me û kihêla xwe berde.
 - Reşo li ber çavê min e gava min ser peyên wê û teriya wê hine dikir û her wê serê xwe radikir û bi lingên xweyî çepê zemênî vedida.
 - Lawo Remo rewşa te nuha çewa ye? Aboriya te? Têkiliyên te? Xwedê hiştto kihêl çû çavên xwe veke nuha tirênbêl û otobûs hene? Balefir hene? Radyo û televizyon hene?
 - Tew! Kihêla min jî tîne ber van tiştê pîsik! Ma gava di pêşbaziyê de sînga xwe bilind dikir û teriya xwe bi ber bayê dixist û li navmilê min de dida, ma tişteke jê çêtir hebû.
 - Kihêla te? Sorbeleka te? Canikê mala wê ava be? Lê dem hate guhertin, xelk û raman û cîhan di warekî nûjen de ne? Tu xêr di kihêlê de nemaye?
 - Reşo! Bi xwedê ezê ji te bixeyîdim..? Çawa xêr di kihêlê de nemaye?
- Reşo matmayî ma! Lê bêdeng ma, naskir ku destbirakê wî gotin di serî de narin, tenê lê nerî û serê xwe ji gotinên wî re hejand? Remo jî her pesnê kihêlê dida û

25

- toza ku bi ser serê wê de kom dibû û afrandinên wê yên dîrokî û li gor Remo divabû bibin serpehatî ji milletên cîhanê re!
- Torbîto ket bajarê Amûdê, Reşo kurkê xwe li ser milê xwe rastkir, destmala xwe li serê xwe baş pêça û dengkir ji bo Torbîto raweste.
- Reşo tê çi bike?
 - Remo ezê li Amûdê dakevim? Nema tîm Qamişlo?
 - Ma qene tu naçî cem pijîşk..?

-Na! Ji derdê te û kihêlê lawo? Remo xwezî min te nedîta? Tu hîn ê berê ye, divêt tu li Mûzخانê ba ne di jiyane deba? Tê bimrî û tim tê di kevn de bijî? De ne bi xatirê te...!

Bi gotina dawî deryê Torbîto girt û berê xwe da çayxana Amûdê belkî xwîna xwe sar bike.

Qamişlo 19.2.2002

26

MIN ÇI BI SERÊ XWE KIR?

Di çayxaneyek ji pêpeloka çaran û li ser maseyekê di layekî tarî de rûniştibû. Bi tenê, bi çavên melûl xelekên reş ew pêçabûn, serê xwe xiste nav herdû destên xwe û diponijî di bin lerizandina his û damarên laş de. Çawa di roj û şevê de, di wî bajarê mezin ve derket! Ji sibê de bê armanc dimeşiya, nayête bîra wî dema dest bi meşê kir! Lê hestên wî bi westandinê hişt ku mecbûr bibe û dagere vê çayxaneya tijî düyên çixariyan û bihna şewata ergîlan.

Ji xwe bi êşa peyan ne hisiyabû, çimkî êşa herî mezin ji serî ve dihat, lewma serê xwe bi herdû kefên destên xwe pêça, da ku hinekî xwe vehesîne û hêza xwe vegeîne!

Li ser wê masê û bi wê ponijandinê de, paşvegerê ji jiyana xwe kir, nemaze bûyerên ew jiyana guherîn û karîbûn dîrokek nû biafirînin ji kesîtiyek wînda re! Ji xwe ew bûyer weke pêlên derya di nav çavên wî diketin û jiyana wî başve vedgerandin!

Ango dîroka wî roj bi roj li ber çavên melûl, giş ew kom kirin. Ji roja bîr bûye ta ku roja şemitî û daket vê pêla bi saw ji nerindiyê!!

- Muhr ke...û emê te ji bin eskinan derînin!

27

- Muhr ke... Muhr ke... û emê jiyana te bikin buhuşt! û tê ji bin xakê derkevê! Ji bo wateke ji jiyana te re hebe muhr ke!!

- Muhe ke.... Gelek ji hevalên te di vir re derbasbûne û muhr kirine!
- Muhr ke.... Hevalên te ji me re gotine tu çi dike!
- Muhr ke.. Emê te hildin jor û rewşa te çareser bikin! Muhr ke.. Vêre tê lehing be di civatê de û wê abûriya te xweş bibe!
- Tê çi vexwî?

Dengê xwediyê çayxaneyê ew veciniqand û vegerand e jiyânê, loma bi lez got: Çayek giran.

Bi vê daxwazê hevaleke wî hate bîrê, ji xwe gava hevdû didîtin, li qoncikên bajarokê xwe de, timî bi qirta pêşîn ji çaya giran helbestek vêre digot..

Şêrê ji heft bavê xwe şêre..

Dozê bi şêrî nakitin!

Pîse-dolê heft kopekan..

Ew-ew diket eslanim ez!.

Xwest berdewam bike, lê dawiya helbestê nedihate bîra wî! Axînek kişand û nifir kire wê dema ku tê de qelsbû û ji wan re muhr kir! û va nuha berhemên wê

28

muhr kirinê dide! Bi wê muhr kirinê jiyana wî ya serbixwe qediya û rewşa wî tevhev bû û li gor daxwazên stêrkan dimeşiya!

Ango bibû weke segan, rûniştin, rabûn, gotin, tevger û livandinên wî tev bibûn bi biryar!! Bû nokir li ser heval û mirovên xwe, xwezî tenê wisa jî.. lê bi nivîsandin pesinê latên di ser sînga mirovan jî dida û ew dikirin bayek hênik û zelal!!

Di dema ku sûdeya wî hebû, wan jî bi hemû rengan ew pêş xistin û astengên wî çareser kirin û di roj û şevê de bibû nêviyê şikefta roniyê! Wisa jibîrkir ku tiştê pêşiya wê ne rast be wê dawiya wê jî ne rastbe!! Lewra jî gava tîrêjên mafedariyê siya xwe berdan ser deşt û şikeftên

mejiyan! Ava bin kayê de jî miçiqandin û hin ji rastiya veşartî diyar kirin!!
Hingî xelekên reştarî li der dûra çavên veşartûk xuya kirin!

Hawar kire serwerên xwe, belkî alîkariya wî bikin û roleke nû jê re
biafirînin!

Lê tiştê ne di bîra wî de bû û xwe jê re amade ne kiribû û ji nişka ve di nav
riwê wî ket! Gava kesê ku li paş maseyê rûniştibû û stêrk li ser milê wî
dibriqandin qot:

- Kesê ji milletê xwe re nebe! ji xwe.. ji mere jî nabe..!

Qamişlo

29

DEM, DÎWAR Û NIMRE

Hêdî hêdî dimeşiya, bêdengiya şevê tenê du dengê zumênî ji guhên wî
tanî. Û tevlîhev dibûn, dengê ji jor û yek ji jêr û xwe di nava wî de li hev
badidan, ew herdû dengê dil û lingên wî bûn.

Her yek ji wan jî, ji êşek taybet deng dida, lewre dimeşiya di wê şeva
zîzbûyî de, ramanên wî jî tevlîhevin ji ber ku mejiyê wî bê hedar û tebat
bû. Ji ber pîrbûna wêneyên giring di serê wî de, yên ku li ser wî qewimîn
û weke flîmekî di ber çavên wî de derbas dibin, helbet ji dema ku jê re
gotin; Here lê ji bîr neke em dikarin dîsa te bînin!

Û ewî bawer nekiriye ku ji wê qutiya niftikê derketiye, gelo ev yek ji
xewnên xweşe, yên ku di wan xewên xwe didîtin, gava ku lingên xwe
dixiste nava zikê xwe de, ji ber ku di wê qutiyê hilnedihatîn!

Li dor xwe dinêrt, destên xwe bilind dikir û meşa xwe berdewam dikir.
Qutî û tarîbûn û petoyên ji hev ketî! Hatin kolan di mejî de, êdî ne
hewceye tiştêkî dî bê gotin lê ramanên wî çiqas diçûn ser dostaniya ku di
qutiyê de ji xwe re, bi xwe re çêkirî, seyîneke bi mirov re radibe û rûdine,
her û her li ber çav û destê mirove!!!

30

Dîwar.... Gelo çima dîwar hatine avakirin? Gelo ev mirovê yekemîn yê ku zinar kolan û dîwar û şikeft çêkirin ji bo parastina xwe bike, qene xwe ji xwirstiya lawiran biparêze, gelo gava zanîbûya ku wê rojekî dîwar bibin bobelateke li ser mirovên azadîxwaz û mirov di nav wan de bibe sawêreke. Dev, gûh û çav girtî. û helbet mejî vala û bê raman. Wê ewî mirovî dîwar çênekiriba!

Lê dîsa jî pir sûde ji dîwara heye! Ta ku giringiya dîwaran hiştiye Yılmaz Gûney nav li flîmekî xwe bike. Dîwar bi rastî jî du layên wî hene, vajî hevin û guhertin bi hêsanî di nav wan de dibin! Nemaze di xelateke tawan hazire, nivîsandiye û tenê nav jê kême! û kes tune bixwîne. Ber tev dirav didin hev û ne valene ji xwendinê re, lewre çî kes tê qutî û dîwar li hêviya wî ne.

Yaseya ku dimişe û dadî li ser avabûye, her mirov tewanbare heta ku bêgûnehiya xwe bi cî bike?

Dîwar....Sare û bêgiyane tev wisa jî sûdeyên pir di wan qotiyên de, di dîwar de heye. Dîwar depreşeke ji bo nivîsandinê ye, salnamêye, ciyê bîranîn, xwendin û nîgariyê ye?.

Dîwar li min bibûre! Tev kêmasiyên te jî lê başiya te jî jibîr nakim! Çimkî bi wan xêzên bi dendikên zeytûnan

31

min roj û şev nasdikir, ji ber roj û şev yekbûn! Tim hin tîrêjên roniyên ji ban û di nav tora sîxên hesinî dihatin..

Nimre... Di qutîkan de mirov bê nav dibe û dibe nimrek! Ew bi xwe nimra wî dîwariye! Jiyan gelek serêjên vajî hev têde hene, hin nimra li ser hev kom dikin di bank û welatên biyanî de.. û hin dibin nimra dîwarê qutîkan! Dem... Di qutîkan de nayê naskirin lê mirov hîn dibe û dema xwe jî li gor sêyîna xwarinê, cote bi *sêyîna (dan) jiyanê. Yek armanca wê berdewama jiyana mirove û yadî jî xwesteke ji bo kûştina mirov di hûndirê mirov de!!

Sêyînek e... Pir bi êşe û di qutîkê de mirov tenê li tişteki digere ku li hember bisekine, ew jî hezkirine; hezkirin hêvî û vine, Hezkirin li dijî dem, dîwar û nimrê ye.

Lewre vîndara min ez ji te hezdikim..! û vîn û jiyana min wê hezkirina te her û her li dijî sêyîna berdewam bike.

Qamişlo 32

BÊSINOR SINOR E?

- Hêdî..! Malava li ber xwe binêre, heger hayê te ji serê te tine be, bila hayê te ji dîwar û mirovan hebe?

- Bibore Zero, Ji ber bîntengiya mejî, bi çol û cadan ketime.

- Xemo ka were em li cihyekî rûnin û çayekê vexwin.. kul û derdên xwe ji hevre bêjin.

- Bi xwedê dibeziyam, lê nizamim çima û ji bo çi..! Lewra pêşniyara te dipejirînim.

- Emê herin çayxana Şingo.

- Baş e.

Herdu dost dane tengala hev û berê xwe dane çayxanê û meşyan her yek di hûndirê xwe de pirs û bersiv amede dikirin, derbasî çayxanê bûn dûtê cixaran mijek wekî ewrên reş û tarî di ezmanê çayxanê de çêkiribû, 33 masek di koşeyekî de vala dîtî, rûniştî. Zero herdû kefên destê xwe li hev xistin û bi dengê bilind bakir:

- Şingo, du çayên giran, û kêmşekir.

Şingo bêyî ku bersiv bide serê xwe hejand û bi lez du berdax çayê li ber wan danî.

Xemo de ka bêje çima serê te di tewtîhê û li bin guhê dîwaran diket.

- Bi xwedê, tişteki binê cênîkên min li hev xistin û hiş bi xwe re birin seyranê, ne tu zanî helwest û gotinên vajîhev, ango gûhêzok serê min pê re gêj dibe, û ronî di çavên min nahêle.

- De ka bêje, bira ma mirov guh bide van tiştan wê temen biqermiçe, ma ne bese êdî por û riya te sipê bûne! Bêje gotinan di sînga xwe de nefetisîne! Bêje û xwe vehesîne!

- Birakê min û te, Bazo! Şêro navên wî pirin! Min sûnd xwaribû ku tucarî pêre gengeşê nekim, çimkî gotinên me di serê hevdû naçin. Ji bexetireşîya min îroj piştî kar ez çûm serdana bixaletiyê xwe, ew jî hat.. hîn şûna xwe germ nekirbû dest bi axaftinê kir, lê vê carê ne kaset berê bû, Devê wî têra tomarê ye bi rastî kaset kevne-nû bû, min jî ji neçarî guhdar kir û her

34

berdewam fikir xwîna min dikeliya û gotin rêz dibûn, lê bi dijwarî min ew vedigirt, mal virityo hingî pêşde çû toz pê xist, êdî hew zimanê min xwe di nav lêvan de girt û tu sînor ji bê sînoriya wî re nehişt?.

- Te ez hişyar kirim ka bêje çi di got.

- Bi kurtî ezê ji te re bêjim, digot ava çemê Ferat rabûye, zelal û sipê ye weke berfa çiyayê Sevîn e! Şêrîne weke ava Zabê ye û hingî bi lez û bez diherike, hima bêje daye ser ava çemê Diclê!! Diclê ji xwe şade lewra Kerkûk û Mûsil li pey xwe aniye!!

- Weyla mal xerabo!!

- Hîn dixwest berdewam bike, lê min dengê xwe ji ê wî bilintir kir, ne dihişt weke xuristya xwe ez bi axivim, heta civatê ew sekinand û hiştin çend gotinên xwe bikim!. Min jê re got:

- Li min bibûre Bazo! Şêro? Nizanim navê te îro jî çi ye! Belkî Kamo be! Tenê ezê hin gotinên te bînim bîra te. Doh bû di civateke wisa de te digot ava çemê Feratê hema dike bimiçiçe..! Ji ber jinên gundên li ser çem cil û berên xwe yê rengîn di ava wê de dişûn!! Av bûye hemereng nayête vexwarin! û mirovên me 35

bi piya ji Diclê derbas dibin! Malxerabo doh te wêniyek girtibû te piyê lingên xwe yî çepê dabû ser goga zemînê!! û îroj te qerewatek avêtiye ser milê rastê!. Wêneyên alên sed û şêst kişwer li serin û tew bingeha wê sor û bihîve jî! Lawo bese! Çerm ne qutikin li gor demsalan bêne guhertin?.

- Xemo, tu gelekî pêşde çûyî.

Lê min dawî jê re got:

- Tev wisa jî ez gelekî kêfxweşim ku te kasêta xwe guheriye! û wê bêtir şahiya min zêde bibe gava tomargeh ya te be!! û ji civatê rabûm.

- Ezbenî ne cara yekêye ku xwîna me dişwete û dibe ard (red) ji Havmal re!! Bapîrekî min hebû di derbarê rewşên wisa de digot ku: Di navbera guleya yekem û ya dawî de sîng hatin guhertin, mejî hatin guhertin, armanc hatin guhertin û welat hatin guhertin!!

- Vexwe çaya te sar bû.

- Belkî xwîna min hinkî bicemidîne.

36

- Belkî! Birako çay ew çayê ye! Nav ew nave! Tenê xwîn çerxa felekê ye, geh li jêre û geh li jor e..!! Vexwe çaya giran û têrşekir!?

Qamişlo - 5-2-2002

37

YASEMÎN

Diyarî

Keçeke nazdar

bê himdî em rastî hev hatin.

- De ka biryara we bû çî!

- Ma ne em gelê paşvemayan dikarin her tiştî bikin, bilî standina biryaran, di vê mijarê de dudilî heye.

Wisa min li Yasemîn ve vegerand.

- Em jî ji dudiliyê hez nakin.
- Babet ne hezkirine yan na ye, lê xaleke di hebûna me yê mirovantiyê deye, bi xwe encameke ji dîroka nezaniyê ye, çimkî mirov gava xwe nas ne kiribe, nikare biryaran bistîne û em jî ji milletên bê nasname ne.
- Ma ne bese ku em guhertinên bingehên di mejiyên xwe de bikin.
- Guhertina mejî perwerdiyeke şarezaye, rojhilatî gelek dûrî wêne.
- Her divê hin destpê bikin û baca wê jî dînin.

38

- Rast e...

Kêlîkeke bêdengî derbas bû, lê Yasemîn dîsa pirsaxwe yî yekem dubare kir. De ka we go çi?.

Min û hevalê xwe li hev mêzand û bi serî hejandinê, gotin hate kirin :

- Em herin.

- Her çar me rê girt û ber bi mala Yasemîn û Nazê ve çûn, herdu keçên ciwan bi hev re dijîn û bi serxwebûna xwe dilşadin ango weke naveroka mirovantiyê dixwest, bi wateya ramanên xwe jiyana hilbijartibûn û di derbarê vî warî de Yasemîn bîr û baweriyên xwe şirove dikir, lewra wisa digot:

- Nakokiya min kişand di destpêkê de, gelek layên wê hîlbûn ezîtiyî û girêkên hunderê min yên ji civatê yan ji olê yan ji malbatê hatibûn hilgirtin, helbet gund weke sêstem ji tîkelî û ramanan tê de diyar bûn, tev dibûn kelem bi tawan û qedexeyê kirina jiyana keçan bi tena xwe, lê her zanebûna min li pêşdiket wisa jî kiryar û vîna min xurtir dibû ku ez weke mirov bijîm, ne weke kolekî bask şikestî û xwestika min ê yekem bû ku sedema serekî ya jin li ser qiraxên civatên zîlamtiyê hiştiye! Weke çand di dîrokê

39

de maye. Ew jî azadiya aborî ye! Ji xwe ew nayete kirin, ku ramanên wê di mejiyên jinan de çê nebe, lê mixabin siya nezaniyê daye ser jiyana civata me û bi taybetî li ser jinan dudûmêne! Tev ku pesnê jinê tête kirin di warê evîniyê de, lê weke tiştêkî geregiya zilam pê heye, ne weke mirov beşdarin di civatê de, êdî min têr xwarî ye ji gotinê pûç û zuha, mebesta min weke hunderê xwe vekirî bijîm, rol û helewestên xwe di rojane de pêkbînim, çimkî di nerîna min de azadiya jinan stûna yekeme di azadiya civatê de, ev bawerî jî hiştin ku biryara serxwebûna kesîtiya xwe bi cî bikim.

Gava Yasemîn dîroka azadiya xwe digot nerînên wê yê hêrsbawer libû-libû di mejiyê min de cî digirtin, nemaze xurtbûna hizirbûna wê, awirên çavan di tewîne! Hingî gotin weke kaniya ava zelal ji kezeba wê derdihatin.

Wisa min dît ku Yasemîn gotina Voltaire tîne holê:
“Armanca yekem û giring ji min ve ku ez bi dilşadî bijîm.”

Û nerînên wê yî hemdem nêzî kar û baweriyên Zeradeşt dibin. Zara ji çiyê daket ol û bîrbaweriyên xwe belav kir, wisa jî Yasemîn bi bez, tevger û bawerî dixwaze pute-raman û çiyên qaşê ji mejiyê civatê de hilîne, lewra Yasemîn wisa digot:

40

- Taybetiya jinê her cudabûnê naxwaze, lê ez azad nabim tenê gava bixwînim yan jî bi kêsima jiyane bijîm, di baweriyê min de ez kar bikim jiyana xwe bi evînî bijîm, hingî dibêjim ez azadim, loma têkeliyan dipejirînim dema herdû layên wê.. weke hevbin ne berjewendiya koletiyê

be! Ango mejiyê min serokatiya jiyana min dike li cem min hebûn bê nerxe gava bi rastiya jiyânê ve nête girêdan.

- Yasemîn du rûtiyek di civatê de heye û jiyana her weke xwe dike, tenê mirov dikare tev li tirêna wê bibe û bi vekirîbûna kar û ramanên xwe bê par nemîne.

- Ez dibêm ku ez keçeke vekirîme, di raman û jiyana xwe de, tev ku ne zelalî heye di pêvajoya tirêna jiyânê de, lê timî ez dixwazim ji kesê rûniştî bim! Ango çî di tirênê de bigrim, çimkî tenê xwediyên xewnan rabûkî dimînin!! Ji ber ku her dereng dimînin?.

Ji xwe yekem car min guhdarî Yasemîn kir di civateke taybet de, bi wî dengbawer û asta ramanên wê hêzeke girêdanê di hiş û wijdanê min de çêkir û ew bi xwe ezmûna pêşîn ji nasnemeya wê bû. Lê hingî baca dostaniyê û hevaltîyê ziyaneke mezin li min kiribû û şopeke zêvar di heşê min de kola bû.

Lewra pêwîstiya dîtina Yasemîn di mala wê de giring bû bo velobikim naverok û mejiyê wê, ji xwe jî di wê civata mal de axaftin reng–reng dibû û vêre xalnî nû di 41

kesîtiya Yasemîn diyar dibûn, nemaze gava di axivî min awirên çavên xwe li cem tîrêjên tevgera çavên wê rawestand, lê ramanên min dûr û kûr diçûn layê bûyerên derbas bûyê û derbas nebûyî de, lê her bi pirsekê dihate girêdan çima?.

- Civata me bi layê mirnê ve diçe!.

- Bêdengî li ser vejîna mirovan heye?!

- Rola bîrbaweran tê veşartin?

Diyare ku qalikên vala pirbûne, lê di nav pêlên kesan Yasemîn bi hestên xwe yên awartî, karîbû perda bêdengiyê hinkî biçirîne, çimkî xuristiya serbixwetiya kesîtiya Yasemîn simbole di civata meyî ji hevketî de?

Lê di çi asteyê de jî tê sûde kirin!! Nemaze di civateka nexweşiya zilamtiyê di xwînê de ye??

Ev arpijîna azadiyê di hundirê Yasemîn de, tebatî di mejiyê min de nehiştêye, loma jî ezê her li benda mejiyê wê bim!!

Bibore: Yasemîn belkî ev tenê ji mafê min e.

4/8/2001

42

KÛPÊN HEMDEM

Bê rê xweşkirin û pêşgotin raste-rast ezê ji were bêjim Kûp çiyê? Navê Kûp bi avê re dihate nasîn, an jî avsarka her malê bû, bi xwe ji axa sor a şewitandî çê bibû, li ber siyê dihate danîn, tijî av dikirin û çend çîn çewal lê digerandin û di kelekela qerma havînê de, avek sar û hênik ji mirovan re amade dikir.

Ev rola Kûp bû li cem her maleke gundî, lê taybetiyek din jê re hebû, ji dewlemendan re jî dibû xizîne, tê de zêrê xwe yê reşadî û kemalî vedişartin! Ango herdû rol jî giring û hêja bûn, qencyek Kûp li mirovantiyê hebû. Raste ji afrandina mirovan bû, lê ne her afrandin qencyê vedigerîne!

Rojekî ji kul û derdên jiyanê raman û helwest her yek dipengizî alîkî, bêsinor dipijiqin. Ji wê yekê jî diponijîm di koşa xwe de, flîmek ji bûyeran di ber çavên min de dibûhirin, perê wan jiyan reştarî dikirin! û hin ji wan pirsên zelal tanîn holê! Ma gelo çima mirovantî di qalikên mirovan tenê de maye?! Çima kerikmejiyên xwenda pir bûne?! Çima gotin, wijdan, mejî, zanebûn erzan bûne, çima... Û çima?

- Ev raman di zîzikîn di bin guhê qapaxa serê min diketin û gargerîna xwe berdewam dikirin, çavên min pêre melûl û dernexûm dibûn, tenê serê sola min didîtin! Ji nişkave bi tiştêkî lukimîm û li zemînê 43

rastbûm. Bi ef-ef û nefret min li dûr xwe mêyzand lê dengê kelegirî
lêborandina xwe dixwest.

- Li min bibûre ezbenî!

Bi dengê wî re, ez li xwe hay bûm ku yê ez pê lukimê Kûp e!

- Na tu li min bibûre, bi rastî hişê min ne li cem min bû, lê tu çima wisa
digindirî û hêsirên te weke kaniya zemzemê diherikin...

- Çîroka min dirêj û tale!

- Belkî te dilê xwe girtibe, çimkî kes nema bi te qayil dibin û rola te jî
nemaye!

- Ji xwe kêşa min vajî wisa ye! Çimkî roleke nû ji min re afrandine!

- De bese bavo, Eleketrîk û pêşketina teknolojiyê tu hebûn ji tere
nehiştine!

- Ne perîşaniya min li layekî, û kesên bê çerm mirov li layekî.

- Wa ka bêje, ma mirov bê çerm hene? 44

- Belê hinek kes hene ku çermê mirovan li xwe pêçane, û hin kes jî bê
çermin û herdû bi mirovantiyê bazirganiyê dikin!

- Baş e.. lê ya te çiye!

- Ma tu nabînî ez bi lez û jarî dibezim, ku herim nifûsê navê xwe
bigûherim! Bela bi ser min de hatiye, bi serê tu kesî de neyê! Ma ne yên
bê çerm navê min li xwe kirine! û yê bi çerm navê kurê min Şerbik li xwe
kirine! Ma ji vê bobelatê mezintir tiştê heye!!

- De ka hêdî bêje, te dilê min bi xwe şewitand.

- Ez serê te û dilê te naêşînim, bi kurtî ji te re raxim, lê pêşî helwestek ji
serpêhatiyên tên bîra min, ew jî gotina kalemêrekî gundî bû. Gava zivêr
dibû ji gotin û reftarên kesan, serê xwe dihejand û digot:

- Ev jî ji xwedê ye! Çimkî gava kîn û dexsî belakir, neh da Kurdan û yek li
milletên cîhanê belakir! De ez hatibûm naskirin bi başî, min av sardikir û

zêr diparast, razîme bi xelaziya rola xwe, lê çî kesê tolaz û rûtund û dijûne navê min li xwe kirine! Qet bi vê yekê nerazî me!

- Ma ji zûve tê bîra min, navê te li kesê bê rûmet dikirin, an jî digotin filankes Kûpê namûsêye! Bi wateya tinebûnê!

45

- Raste lê hingê ji herêmekê belkî te yek pêda bikra, ewî jî ji şerma serê xwe dixist bin axê, lê vêga serê xwe bi şermê dipêçin û pir jî xwe pê qure dikin! Loma em gelê Kûpên belengaz xwe diparêzin û xwe vedişêrin, mixabin em bi kûve herin navê Kûp tê bi lêvkin, lewra me biryar da ku em û kurên xwe şerbik li xwe bipirsin û doza guhertina navên xwe bikin, û bila nerind navek din ji xwe re bibînin! Bawerke wê rojê, li qiraxa gundekî digindiriyam, min dît yekî bi çerm! Dûdev, berbezir û sixtebaz halana bi navê min hildida! Min xwe negirt, nêzêk bûm û gengeşek mezin pê re kir, kesekî nerind wê çima navê min li xwe bike?! Mixabin ez deyndar derxistim ji ber çepe-rast û hevraz diçû û dihat! Min fêmkir ku gelek bingeh tê de nebûn! Tenê mejî û dil û laşê xwe tijî bêbextî û zikreşî kirbû!! Lê diyare ku ew kes hîn jî bi têtûzî nehatibû dagirtin ji wê yekê jî lêborîna xwe xwest û got:

- Ez hîn şerbikim!!

- Ma ji vê felaketê mezintir tişteke heye? Ma sedem jê mezintir heye ku em gelê Kûpan navê xwe bi gûherin! û matmayî nemîne, ew kes xwest min bibe cem sermezinê gund, xwedê giravî Kûpek rengîne?.

46

Wisa bi gotina xwe ya dawî hêstrên xwe paqij kirin û gindirandina xwe berdewamkir. Min dixwest jê bipirsim ma gelo ew kesên nekes nexwe wê çî navî li xwe bikin! Lê gotin di gewriya min de asê bûn û zimanê min lal bû ji vê hişmendiye!

Ez ramiyam bi wan gotinan, diyare ku rolek nûjen ji Kûpan re hatiye afrandin! Ma bi rastî mirov wê çi navê li kesê millet firoş û çavpan bike! Navê xwe kirin Kûp? Gelo ji ber ji heriyê çêbûye? An jî zik mezin û bê xwîne? An?

Goriya min diyare ku Kûpên Kurdan pir li pêşin, sûde ji pêşketinê pir dîtine. Lewra jî gelek ji wan midûrin, ne tenê bi qerewatin lê belê bi berçavin jî!! Hin keçel û por sipî ne.

Şabaş ji Kûpên hemdem re! Min dixwest ku kumê xwe ji wan re rakim! Lê bila bibûrin ez tu kuma li xwe nakim!

Qamişlo 29-1-2002

* Kûp = Sewîl, curnê avê ye.

47

REWREWK Û ÇAV

Tirim..Tiriiim... Eve dengê cadê ye, dengê mişixtî dest vekiriya ye! Ji kolanên milletê Kurd e!

- Gelî guhdarên hêja!

- Yên ku bi şev û rojan agahdarin li benda ezgeha mene! Nanê Tesî dixûn û bi avê re bi nûçeyên me di gewriya wan de asê dibe! Tev wisa nuha emê ji were şirovekin nûçeyên bi bihîstokê ji mere hatine!

- Guhdarên delal! û dixweve çûyî!

- Di katejimêra bîstan ji şeva bê roj de, şer dest pêkir! Xeleka berp-dewam ji şerê birakujiya şûşan? Tê ragihandin li gor nûnerê me ji zemîna têkoşînê, digot gelek şûşe şikestin û hin jî sax mane! Lewra nûçe pir têne gotin û bi lêvan têne weşandin ku sedema fertona vê carê hebûn yan nebûna şûşeyeke biçûk û belengaz! Du şûşeyên mezin dixwestin wê par bikin! Hin dibêjin koçerin û hin dibêjin mişixtîne, emê wan vegeînin çiyên jê hatine?

- Tiriim! Biborin wê bihîstoka me ji were vê kêşeyê ronî bike! Diyare ku ji bo padîşah razî bibe û av di sînoran de beherike! rebenên şûşa

48

biçûk têne mandel kirin! Wisa jî dibin ardû ji kargehên hawîr dore! Wan dikin lastîk, şimik, pira û dikevin zik mezinan û tizbî dirêjan!!

- Guhdarno vedengek tê? Ho ho dibêje ma gelo mam ji ap re negotiye? Ev kar bê kêre?!..

- Dîsa guhdarên hêja.. bibûrin çimkî dema propoganda ye!

Tir-tiirrr-riimm.... Tiirriimmm...?

... Pênûsa padîşah! Ji bo nîgar, wêne, muher! Nivîsandin, kirîn û firotin! Di hemû ximav re sobayê dike! Nûçeyên reş dertîne, welatan difroşe, parçê biçûk dadîqûrtîne! Şûşeyan tengezar û mest dihêle!

... Pênûsa padîşah ya hemû demaye! Ji bîr mekin bi her pênûsekê re diyariyek heye! ...Pênûsa padîşah ji manfêsto û raporên bi simbîl re ye??.

- Guhdarên hêja!

- Di katejimêra sekinî de teqîniyek xurt ji barê pirtûkan yê ku zenbîlfioş weşandin! Agir vejînek derbû, bi xwe ne cara yekeme ku fermana tinebûnê û bişaftinê çê dibe, û her serdest tev berdestikên wan tenê şûna rûniştina xwe dişewitandin? 49

Tiirriimm.... Benîştê sinciyê! serjêkirina Kurdiyetê ye!! Tiştêkî qedexe tê tune! Dil hênik dike, layekî jê digre! diranan paqîş dike, yê mejî jê davêje!! gelekî arzane, tenê parçekî bifroşe! Wê padîşah ji te razî be? Benîştê sinciyê di nav çavê we deye!!?.

- Guhdarên hêja!

- Peymanek nû di navbera Keneda û Penema de çêbûye! Ev di bin akamiya cildên ramanê me bû?? Ev peyman bûye kelemek di riya serxwebûna me de? Lewra divêt em êrîşê berdne vê peymanê û wê beherivînin!?

TTiirriimmm.... Eve dawiya nûçeyên me û ta nûçeyên din hûn tim serkeftîbin?

50

KIŞWERA XIRNIKAN

Bo hemû xebatkerên dilsoz

yê ku satûle û nerind-ked

û avabûnan bela wela dikan.

- Wî li min rebenê! Çi bi serê me ve hatiye!

Dayika Xirnikan wisa digot û bi tepa bi serê xwe diket û bi tirs hêsek gotinên xwe berdewam dikir, nemaze bi çavên xwe didît ku her sê xirnikên tevlî wan bûn.. çi bi serê wan ve anîne, bibûna rêber ji beyaniyan re! Lewma dayika kezeb peritî bi hewar û qîrînê bû, ji kerba xirnikên çewte jiyar.

Çîroka kişwera xirnikan dirêj û bi girêke, çimkî ev kevroşkên tirsok û bê zirav bi saw dijîn, ji ber neyarên ku hin li goşt; Yan li çerm; Yan jî merqdariya kedî bûnê digeriyan, her encam ji xirnikan re yek bû.

Dayika reben bê çare dima ji bo paristina kişwerê. Ji roja her sê xirnik milên xwe danehev û dûrî gerdişên civatê çûn! Ji xemgîniya dayikê bi dengê bilind çîroka zayîn û hebûna her siyan şirove dikir, digot û hêsir weke zîpika ji latekî çiyê digindirîn.

51

- Law gotinên min xweş bibîhîsin! Tomarkin û di pêşeroj de bînin bîra xwe! Law...

- Yê yekem, navê Kermij li xwe kir bû, çimkî di bin kûrtana kerê de çêbûbû. Û roj bi roj kêsima wî dihate guhertin, gurî û keçel dibû, lewma jî bi navê keçel dihate nasîn!.

- Keçelo, bi zarokatiya xwe di nav serguyan doman de bû û li bin baskên pêlên wê xurustiya de xwe avakirbû, lewra zanebû, lê erzanbû û gelacî tê de hatibûn çandin! Ango her tişt tê de peyda dibûn, bilî mirovantiyê! Ev koma nerindiyê ji bavê xweyî nenas hilgirtibû. Kermij çav şikestî bû, tenê di pist-pista paş pişta mirovan rol û kesîtiya xwe didît.

- Yên duyemîn, bi navê Koso dihate nasîn, roja zayîna wî nenase! Lewra ne dayik û ne bav dihate nasîn, lê roja hate naskirin.. berçav û bi pêlav bû, her û her xwe di hemû rengên heriyê de diseyand! Ê li gor rojê, şev û ba dihate guhertin! Loma jî keysbazekî ladan; Anînberek hogirên xwe bû, di der barê wî de kalemêrekî xirnikan wisa digot:

- Gava Koso derbasî kişwerê bû pêxwas û por sipî bû! Lê perwerdiya wî ya berê hişt ciyekî bigre! Taybetiyek wî jî hebû li ber bahozê xwe 52 ditewand, tenê berçavê xwe datanî û xwîdana eniya xwe paqîş dikir! Bi nîv kenekî mirarokî lêvên qijilî dileqand, ji boyaxa pêlavan, ta bi ramûsana destan jî kar û barên wî bû! Lê her bi kîn û zikreşî dijiya!!

- Şiyên sêyemîn, Qaviko 'digotin' ji nav çeşmên bajarekî mezin hatibû, tenê bê bext; derewîn û perexwir bû! Weke zenbelek dekbaz; pîş; angaş bû!

Dayika xirinkan wisa diyar dikir û banga xwe gûrtir dikir, ji dema her sê xirnik gihaştin hev kişwer li bin gûhê hevdû ket! Heryek ji bo koşa xwe etaxiya nependî dikirin! Ê bi şewazeke serekî liv û tevgera xwe dikirin weke şanîk, tevger li himber avabûnê de xuya dibû! Her û her reşekên şevê ew dileqandin! Loma jî ji bê çarebûn dilê dayika belengaz rawestiya!! Ê bê gor jî ma.

Lê rewşa xirinkan bi gelek putan de berdewam dibû, dilsozên kişwerê bi xemgînî dijîn. Ê tewtewe bi lêvken rola xwe dudûmandin! Wisa jî Emamê E'î gotiye "Gava leheng û dilsoz digrîn, tirsok û bêrûmet dikenin!"

Her sê tolaz ji ber bingeha wanî ne xurustî, ev hêgînîya çewt li cem wan avabû.

53

Bi vê kefteliftê dem derbas dibû, heta rojekê qîr-qîr û haho hahooo! Deng bilind belav dibû û gûrmên û vedeng ji hev ne dihatin cihêkirin, lê rastiyeke xwe tanî holê! Kişwer herifî! û xirnik bi çolan ketin, ango rê û rêwanî tev hatin girtin!!.

Tenê her sê xirnik bi lez û bez kirasekî hemdem bi ser canê xwe yê gemarî de berdan û bi lêvken berê xwe dane kişwerkî ji nûve dihate avakirin, bi destê dilsozan dihate çandin û şînkirin û bi rastî, mafîyasa danesîn dibû. Her sê tolaz bi zayîna xwe yê nûve û bi biryara reşekên şevê re roleke nû ji wan re hate danîn!!Û weke kijnikan her sê dest bi liva xwe kirin.

Loma her û her di dîroka xirnikan de “nezanî; Ezîtî; Nokerî, bi hemdemî berdewam dikin ...

Qamişlo 1/4/2002

54

ZIMANÊ DALQIYAYÎ

Ez û Guljînê em li kampeke awarete rastî hev hatin.

Ji xwe ew berî min li wan dera bû, vêga em herdû keçbûn ji welatê nifreta parçebûyî vehewiya bûn. Tiştê dî yê ku ez û wê tê de hevparbûn, me dizanîbû bi zimanê xwe bi axifin, lewma jî di gelek caran de Gulê zimanê xwe dirêj-dirêj ji koka devê xwe derdixist, ji bo tenê bêje eve nasnameya min, bi rastî gava zimanê xwe derdixist min di dît ku bi çar rengan hatiye xemilandin ji ber wisa jî min dixwest ku zimanê min jî bibîne, lê ji we venaşêrim.. ku min zimanê xwe daqûrtand dibû ji roja çavên min li kum û potînên leşkeran ketibû.

Gulê keçeke bedew bû, çav kesk û bejin zirav bû, helwestên wê weke vîna jîyanê -heger ne bêtir bû, Lewma ez kêfxweş û şadbûn bi hevaltiya pê re,

ji xwe ji roja yekem de girêkên astengiyan vexwar, bûna ava çemê birînê şîroveke û bi lêv bike.

Tê bîra min gengeşeya pêşîn di navbera me de wisa bû:

- Divê ûmîda te, bi te xurt be û zimanê xwe hînê tevger û ramanê bike.
- Gulê, ûmîda min xurte, lê ez tu derfetê ji zimanê xwe re nabînim. 55
- Derfetê ziman ew diafirîne û mirovantî di tevgera wî deye.
- Ma tu li ber çavên xwe nabîne ku nêzîkaya çem tenê qedexeye!
- Keçê ezê nêzîk bibim û çî dibe bila bibe. De ka were em mijara xwe binvîsin û di qiraxa vê jiyana xerabe de tomar bikin.

Xwezî min bi a wê nekiriba, lê hewesa min ne kêmê Gulê bû, ku em vê kezeb reşiya xwe tomarkin. Ê bê ku em ji hev re bêjin, tiliya min beşdarî ya wê bû û te digot belkî yek raman em dimeşandin, lewma diyar bû ku di dilê me herduyan de çare çiyê bête nivîsandin.

Xêzên tîpan li ser rûpela bîrweriya me hatin diyar kirin. tîpa "ç" û pêre "a" r "e"! Bi xuyakirina tîpa dawî " e " bobelata me destpêkir! Çimkî em zîvirîn ku çar windabûye û " e " tenê li \ûn-waran maye.

- Ka çar; min bi dengekî nizim got.
- Ka çar; Gulê bi qîrîn bangkir!

Kes û ne kes li derdora me vehewiyan, de her yek tiştê digot:

- Ev keça bêbext Gulê xewnan dibîne..

56

- Wê çar revandiye û dixwaze me tawanbar bike!
- Tu ji xwe li vê dînê binêrin, ma gava " e " tunebe emê çibikin ji çar!
- Gulê... "e" hebe bese!

Gulê di nav vê gajgajînê de, guhdarî kesekî nedibû, hey bi hêrs û qerebalix li çar digeriya. Ji nav wê komê gundiyeke qerasle derket û bi çeplê Gulê girt, avête ser milê xwe û ji ber çavan winda bû.. ji xwe nefesa min bi zor

diçû û dihat, çavê min zîz dibûn û ziman jî asê di binê çala devê min de mabû. Yekî ji halanvanan destê xwe li milên min xist û got:

- Em dizanin ku tu keçek bîrwere û giringiya “e” dizane!

- Ma Gulê birin kûve? Hema bi zor lêvên min lerizîn!

- Çû li çar bigere, xema mexwe û hay ji “e” hebe heta vedigere.

Min dixwest hîn jê bipirsim, lê piştî xwe da min û ji ber çavên min winda bû. Ji xwe berê tiştek li ber çavên min ne mabû, bilî herdu lepên destê Gulê hildabûn, hingê weke du bêran bûn û bi tiliyên weke serê

57

melêbên kayê bûn. De îca gava Gulê avête ser milê xwe çavên min li piyê lingê wî ketin! mal xerabê te digot belkî ev jiyana xwe tev pêxwas qedandiye, li gor texmînê nimra piyan tev lepên dest dibû nod û heşt.

Piştî wê bûyerê, rewşa min bi nehedarî berdewam dibû, xwedê bide xortekî di wan derare derket jê re digotin Ce’fer hingê li ber barê min yê ji hevketî rabû û yak carna bi piste-pist di guhê min de digot; ezê rojekê ciyê Gulê şanî te bidim, lê divê tu bizanebe “e” rexnan û helwestan tev dipejirîne gava weke wî bêtin gotin. vê yekê digot û pê re bi ser hejandin gelek caran dubare dikir ‘ku heta tu li van deran be zimanê xwe ji devê xwe dernexe’.

Êvarekê li dûr çar mehan ji windabûna Gulê. Ce’fer bi lez hat û di guhê min de got:

- Gulê di şikefta jorî ya tarî û xerabe de ye. Hay ji xwe hebe.

Ji xwe ne sekinî heta bersiva wî jî bidim, berê xwe guherî û çû. Ji wê rojê de min nema ew jî dît.

Rojekê bêdeng ez rajorî wê şikeftê bûm, lê ez matmayî mam gava min dît ku ew ejdeha nimre nod û heşt, li ber deriyekî hesinî rûniştibû. Çendî çavê wî li min ketin, weke qeraslekî dîwaran rabû ser piyan û bi dengekî zirînî got:

58

- Tu çi dike li vir keçê.

- E''e'e...z!

- Tu çi dibelqite! de bicehim e..

Hengê bejin û bala Gulê li ber çavên min ket û hêsek da min û hinekî zimanê min leqand:

- Dixwazim li şiketê temaşe bikim.

- Keçê bicehime, ev girtîngehe!

Ez paşîko vegeriyam û bi sistiyeke bê çare min serê xwe dernexûm kir, lê dengê wî canbazî diket guhê min, gava bang kir:

- Keça tole! wê sibehê hevala te bête cem te.

Ez serê we gêj nakim.. çawa ew şev li min buhirî û xewnên hişyariyê yên di mejiyê min de zîz dibû. Bi qerebalixeke pir mezin roja dî em rabûn ser xwe û kom-civîneke li darket, digotin ku ev dadiye! Dengê gengeşeke dûv-û-dirêj dihate min, bi tevayî li ser giringiya 'e" an "çar" û dawiya dawî biryar hate standin ku 'e" giringtîre ji 'çar" û çi kesê vê yekê ne pejiirîne, arjin û dijî ava çemê birînê ye!

59

Bangeke pê re hat, tê de navê Gulê hate bi lêvkin, bihnekê me dît ku Gulê tête kişkişandin, çavê wê girtîne û ji wêneya xwe a mirovantiyê derketibû.

Û bi laşhejandin ew canbazê gundî jê re digot: zimanê xwe derxe ji bo dadî bibîne! Gula belengaz zimanê xwe dirêj ji devê xwe derxist. Lê hema ew canbaz bi her bênc melêbên destê xwe, hişk zimanê Gulê ji qevdê de girt û bi hêzek cenawer ragêşand! Ew ziman tev zengelokên xwe bi destê wî re hatin! Gulê ramediya li ser zemînê! Zimanê hemereng hate hildan bi çipkên xwîna sor xemilî û serfiraz bibû!!!

Dizanim ku ber çavên min reş-tarîbû, lê gava şiyar bûm kes nema bû li wê meydanê 'e' û kom-civîna xwe tev winda bibûn! Tenê çar rengê zimanê Gulê li zemînê mabûn!!

Heleb 24/5/2002

60

Berhemên çapbûyî yên MEŞAL TEMO

- Gotinek Dawî 10/12/2001 (Bi zimanê erebî)
- Nerîn û Helwest 21/3/2002 (Bi zimanê erebî)
- Rûpelên welatekî bê welat ...

Berhemên wî yên li ber cape:

- Nerîneke rexneyî di diyaroka paşketina siyasî kurdî li Sûriyê (bi erebî)
- Xwendineke di reng û xeyalan de (erebî)

61

**

GURÎ

Amadekar: Zinar Soran

APEC

Weşanên APEC

No: 50

GURÎ

Çîrok û serpêhatiyên kurdî

Amadekar: Zinar Soran

@ APEC- TRYCK & FÖRLAG

Spangaviigen 345

Box 3318

S-163 03 Spanga / Sweden

Tel: 08-76181 18

Fax: 08-7612490

ISBN: 91-87730-50-2

1993

Weşanên APEC

PÊŞGOTIN

Zargotina kurdî gelekî dewlemend e. Bi hezaran helbest, stran, çîrok, serpêhatî û metelokên kevn, heta îro jî di nava gelê Kurd de dijîn. Lê mixabin, di warê nivîskî de edebiyata kurdî ligor wê dewlemendiyê pêş ve neçûye. Dijminên Kurdistanê ew

keys û firsend nedaye neteweyê Kurd ku ziman, edebiyat û çanda xwe bi şîweyekî azad pêş ve bibe. Heta ji dest wan hatiye, xwestine ku ziman, edebiyat û çanda kurdî ji holê rakin. Bi gotinek din, zilm û zordariya liser neteweyê kurd, liser ziman, edebiyat û çanda wî jî heta îro bi dijwarî dom kiriye. Ji ber vê yekê jî, gelek çîrok, serpêhatî û helbestên hêja nehatine weşandin û hinek ji wan di nava pêvajoyê de wenda bûne.

Ji bo vê yekê, vatiniyeke gelek girîng e ku heta ji dest bê, em çîrok, serpêhatî, stran, helbest û metelokên kurdî yên di nava gel de, bidin hevdu û wan biweşînin. Bi vî awayî, em dê ji aliyekî wan ji wendabûnê xelas bikin û ji aliyê din jî, perçeyeke jiyana û têkiliyên wan deman raxîne ber çavan û ji wan îstîfade bikin.

Pêkanina vê vatiniyê, îro ji her demê bêtir pêwîst e. Ji ber ku radyo û bi taybetî jî televizyon di nava bajar û gundên Kurdan de gelekî belav dibin.

Dijmin bi riya van weşanan jî, li hember ziman û
3

kultura kurdî, şerekî bi dizî dimeşîne. Ev weşan li
ser ziman û çanda kurdî tesîrên neyînî dikin.

Ziman û kultura kurdî nikare xwe weke berê li
hemberî van êrîşên dijmin bipolarize. Dengbêj û
çîrokbêjên me êdî weke berê şevbuhêrkên civata
kurdî naxemilîne. Zarokên Kurdan weke berê bi
çîrok û metelokên kurdî nakevin xew.

Hejmara dengbêj û çîrokbêjên me êdî bi tilîkan
tên hijmartin. Eger ew jî herin ser heqiya xwe û ji
nava me koç bikin, wê gelek stran, çîrok û
serpêhatiyên me jî bi wan re koç bikin. Ji bo vê
yekê, divê em beriya ku zêde bi derengî keve, bêtir
hewl bidin ku ji devên dengbêj û çîrokbêjên xwe,
stran, çîrok, serpêhatî û metelokên kurdî binivîsin
û wan ji wendabûn û koçkirinê xelas bikin.

Xebatên weha, wê edebiyata kurdî jî bêtir pêş ve
bibe û dewlemendtir bike.

Piraniya van çîrok û serpêhatiyên kurt yên di vê
pirtûkê de hatine civandin, berê di hejmarên
kovara zarokan "Kulîlk"ê de hatibûn weşandin.

Min xwest ku ez wan di ber çavan re derbas bikim
û weke pirtûkekê jî nû ve çap bikim.

Di vê derê de, bêyî ku ez pênivîsa tu nivîskarên
Kurd birîndar bikim, dixwazim tiştêkî din jî diyar
bikim ku çîrok û serpêhatiyên weha yên di nava
gel de tên gotin, ne malên tu nivîskaran in; xezîne

û dewlemendiya gelê Kurd in. Ji ber vê yekê jî, ez xwe nivîskarê wan nabînim, hew berhevkar ya jî amadekarê wan dibînim.

Tebax 1993

Zinar Soran

4

Gurî ji biçûkanî de, dê û bavê xwe wenda dike û sêwî dimîne. Ew dikeve ber destên ap û amojinê.

Wan çî karê giran hebûya, bi Gurî didan kirin. Rojekê dilê Gurî pir diçe rûnê nîvişk.

Dihere cem meşka rûn, hinek rûn liser nanê xwe dike. Amojina wî pê dihise. Radihêle darçîtekî û bera dû Gurî dide.

Gurî ji wan dixeyide û sûnd dixwe, ku ew dê terka wan bike. Gurî dihere gundekî. Li wî gundî dawet heye. Govendek mezin geriyaye. Qîz û xort ketine destên hevdu, toz û dûxanê bi ser serê xwe dixin. Piştî rawestandina def û zurnê, dest bi danîna xwarina dawetê dikin. Cifniyê mezin tije birinc û goştê berxa liser, dikşînin bin konê reş û mezin. Wek her kesî Gurî jî derbasî ser sifra hazir dibe û têra dilê xwe xwarinê dixwe. Ji xwe, ev demeke dirêj bû ku Gurî xwarinek weha nexwaribû.

Hinek xortên gund dinerin ku xortekî biyanî, gurî û bi kum li ser sifrê rûniştîye. Ew dixwazin hinekî heneka bi wî bikin. Gava ew xwarina xwe diqedînin, dihêrin cem Gurî û destên xwe bi kumê wî paqij dikin.

Ber bi êvarê, naxir dikeve nav gund. Çêlekek ji

5

nav naxirê di ber Gurî re derbas dibe, bîhna rûnê

kumê Gun tê çêlekê. Çêlek devê xwe davê kumê

6

wî. Gurî bera dû çêlekê dide ku kumê xwe ji

devê wê derxîne. Çêlek berê xwe dide dewsbênderan

û Gurî dide dû. Ji bo ku bala Gurî li

çêlekê ye, ew lê hay nabe ku çalek li pêşiya wî

ye û di wê çalê de werdibe. Çal hinekî kûr e. Ew

nikare bi serê xwe ji çalê derkeve. Di dilê xwe

de dibêje; "Çawa be dinya havîn û germ e. Ez dê

îşev di vê çalê de razêm."

Dibe êvar, tarî dikeve erdê. Bûka nû dixwaze

derkeve destavê. Ji bo ku dinya tarî ye û gund

nas nake, ew jî li çalê hay nabe û di wê çala ku

Gurî tê werbûyî de, werdibe. Herdu ji tirsê ne

diwêrin bi hevdu re bipeyivin û ne jî gazî û

alîkariyê bixwazin. Her yek li aliyekî çalê

rûdinin û diponijin.

Demek derbas dibe, bûk venagere malê.

Xwediye zavê bawer dikan ku bûka wan bi dû

hineka ketiye. Gaziya gund bi dû bûkê dikeve.

Her çend gundî bi hêlekê de diçin û li bûkê digerin.

Xortek jî fanosek di desta de ye û dixwaze

bigihêje gaziye. Gava tê dewsbênderan, dibîne

ku Gurî û bûk di çalê de ne. Xort bi dengekî

bilind gazî gundiyan dike:

- Wernê va ew li vir in! Xwedê ji wan re nehiştiye. Gava reviyane, di çalê de werbûne. Her ku dihere însan li ser çalê pirtir dibin û her yek ji hêlekê bi keviran tê wan. Gurî û bûk dizanin ku çi bibêjin wê feyde neke û baweriya gundiyan wê bi wan neyê. Melê gund xwe digihîne ser wan. Ji gundiyan re dibêje:

- Heyran, hela rawestin, em ifada wan bigrin.

7

8

Piştî gotinên Mele, bêhna Gurî hinekî tê ber wî. Piçek hêviya wî çêdibe. Baweriya wî pê tê ku ew dê êdî neyê kuştin. Gurî bi dengekî melûl ji serî heta dawiyê serpêhatiya xwe ji Melê re dibêje. Ji bo ku Gurî şiklê çêlekê jî ji gundiyan û Mele re dîbê; gundî nas dikin ku ew çêleka mala Mîsto ye. Mele ji xortan re dîbêje:

- Zû, bi lez herin çêleka mala Mîsto bînin vê derê. Xortek dihere çêlekê tîne. Çêlekê li wê derê şerjê dikin. Gava zikê çêlekê diqelêşin, dibînin ku kumê Gurî di zikê wê de ye. Mele vedigere ser gundiyan û dibê:

- De binêrin! Tu nemabû me zilamekî biyanî û bêguneh bîkuştî û qetla wî di stuyê xwe xista. Piştî gundî dibînin ku Gurî bêguneh e, li ber wî digerin. Rebenê Gurî xweziya xwe bi vî awayî jî tîne, ku ew ji vê belaya mezin û nedîtî weha bi erzanî xelas bûye.

Gurî ji bo çûyinê destûra xwe ji gundiyan dixwaze. Gundî çiqasî dikin û nakin, Gurî wê şevê li gund namîne. Ew ji nav gund derdikeve û dikeve ser riyekê. Berî ku ew bigihêje gundekî din, xanîyekî dibîne. Gava dihere hundirê xanî, dibîne ku kadînek kayê ye û kes tê de tune ye. Peyvên rîhspiyan tên bîra wî, ku cihê germ û nava kayê ji birînên kevir û daran re gelekî baş e. Gurî biryara xwe dide ku wê şevê li wê kadîne razê. Ew xwe dixwe nava kayê û hew serê xwe ji derve dihêle.

Pir derbas nabe, jin û mêrek ku hevdu revandine dikevin hundirê kadîne. Ji bo ku hundir tarî

9

ye, ew li Gurî hay nabin. Herdu li ser kayê li teniştê Gurî rûdinin. Piştî bêhna xwe berdidin, keçik ji mêrik dipirse:

- Ka bibêje, bê çawa dilê te kete min?
- Gava tu diçû ser kaniya gund, te kûzê avê dida ser milê xwe û xwe bi nazikî dihejand, eşq û ev ina te dest pê kir; di dilê min de zîl da û roj bi roj bêtir şax veda.

Piştî bersîva xwe, vê carê jî mêrik ji keçikê pirsî:

- Baş e. Lê dilê te çawa kete min?
- Gava tu bekçiyê gund bû, darê te di destê te de bû, te bi darê zorê bac û bêş ji xelke distend ...
Bekçî nehişt ku keçik peyva xwe biqedîne,

perwaz da û bi pozbilindî got:

- Belê weha bû. Navê darê min "Lahdo" bû.

Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim, min bi Lahdo weha li wan dixist. Bekçî bê ku li Gurî hay bibe, weke ku bi rastî bêşê ji gundiyan distîne, darê xwe li ser hev û bi hêrs li teniştaya xwe, li Gurî dixîne û hey dibêje:

- Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim, hema min radihişt "Lahdo" û weha li wan dixist.

Gurî ji bo çend darên pêşî deng nekir. Lê gava dît ku darê Bekçî rawestan jê re tune ye, janê da dilê wî, hew debar kir û ji nişka ve got:

- Heyran bes li min xwe, ez ê jî bêşa xwe bidim.

Bekçî û keçik ji tirsaya bizdiyan. Nizanîbûn bê çî hat serê wan. Herdu bi bazdan ji kadînê direvin. Gava bi wê lez û bezê direvin, keçik buxçika xişil

10
Û zêrên xwe li dewsa xwe ji bîr dike.

Piştî ew direvin, Gurî ji nav kayê derdikeve, radihêle buxçikê û bi kêf dibê:

- Xwedê qismetê min anî ber destên min. Va ye min ceyizê xwe dît. Ya baş ewe, ku ez êdî ji xwe re qîzekê jî bibînim, bizewicim û ji ber destên ap û amojinê derkevim.

11

Ev çend roj bûn, xeber gihaştibû gund ku wê qolçî werin. Rojek du rojên pêşî piraniya gundiyan

tûtin û qutiyên xwe veşartin. Roj bi roj
qasî ku ji wan re pêwîst bû, tûtin û pelên xwe dixistin
nava paçikan. Lê piştî ku çend roj derbas
bûn û qolçî nehatin, gundiyan dîsa weke berê
rahiştin qutî û hesteyên xwe. Wan baweriya xwe
pê anîn ku êdî qolçî nayên gund.

Di nav gundiyan de, Hadî weke gundiyên din
nedifikirî. Ji tirs qolçiyên wî qutiya xwe bi xwe
re nedibir odeya gund. Piştî çendekî, Hadî jî êdî
baweriya xwe pê anî ku qolçî nayên. Hadî berê
xwe da paş xanî. Çû ser çala ku tûtin û qutiya
xwe tê de veşartibû. Tûtin û qutiya xwe derxist û
hat malê. Qutiya xwe tije tûtina Xursê kir, destek
pelê Şamê jî da ser û berê xwe da oda gund.
Hadî hîn xweşikî rûneniştibû, du qolçî û du
cendirme ketin devê deriyê odê. Hadî qirçilî;
qutiya xwe xist bin kulav, dilê wî rehet nebû. Ji
wir derxist, xist bin balîfê, dilê wî rehet nebû.
Rahiştê xiste bin kurkê xwe, dîsa dilê wî rehet
nebû ...

Hadî nizanîbû bê çî bike. Hema berî hemûyan
qutiya xwe derxist, dirêjî qolçî kir û got:
- Heyran, hela hûn berî her kesî ceza min bibirin!
Ev çend roj in ku ez di vê tirs û tayê de
bûm. Bila ez ji vê tayê xelas bibim.

12

Hebû tunebû, li bajarekî sê bira hebûn. Ew
zengînên wî bajarî bûn. Bazara wê derûdorê di

destên wan de bû. Terş û dewarên xelkê bi erzanî
dikirîn. Ji ber ku tucarên din tunebûn, xelk
mecbûr diman ku terş, dewar, hirî, rûn û
penêrên xwe bifroşin wan. Ne xelkê ji wan hez
dikir û ne jî ew bi hevdû re rast bûn.

Li nêzîkî wî bajarî gundek hebû. Li wî gundî
bi navê Rizgo cotkarek hebû. Rizgo dixwest ku
heyfa xelkê ji wan hersê bira hilîne. Rizgo qasidekî
dişîne cem wan û ji qasid re dibêje ku hinek
dewarên wî yên firotinê hene. Hersê bira ji bo
kirîna dewaran tên wî gundî.

Rizgo fenek xweşik ji bo wan hazir dike. Du
kîroşkên wek hevdu spîboz peyda dike. Berî ku
here ser cot, ji pîreka xwe re dibê:

- Binevşê! Gava ew hersê bira hatin, tu wan
bişîne ser cot. Ji bo şîvê jî, ji me re elokekê
şerjêke, birincekê û tirşikek fasûla jî bi ser de.

Gava em werin malê, bila şîva me hazir be.

Dawiya mayî tu bispêre min.

Piştî van gotinan, Rizgo gayên cot ji êxur derxistin.

Kîroşkek li malê bi singekî ve girêda.

Rahişt kîroşkê din û berê xwe da ser cot.

Hersê bira hatin gund. Li mala Rizgo pirsîn.

13

Zarokên gund mala Rizgo nîşanî wan dan. Pîreka
wî Binevşê ji hersê biran re got, ku Rizgo li ser
cot e û cotê wî libinya gund e.

Hersê bira berê xwe dan ser cot. Gava ghiştin

cem Rizgo, silav li wî kirin. Berî ku dest bi bazara dewaran bikin, bala wan çû ser wî kîroşkê spî. Kîroşkek bi gomakî mezin ve girêdayiye.

Kîroşk spîboz weke berfê ye û pir xweşik e. Ew meraq dikin û ji Rizgo dipirsin:

- Birako! Ma ji bo çi ev heywanê reben û xweşik li ber vê tava germ girêdayiye?

- Hew, hûn mesela wî nizanin. Ew "Peyê Sivik" e. Ew kîroşkekî pir bi aqil û zîrek e. Ez kurdûnda me. Hew keçikek min heye. Kurê min tuneke ku kar û suxrên min bike. Gava tişteke ji min re lazim dibê, ez ji kîroşkê xwe re dibê, ew jî dihere ji kevaniya min re dibê. Mesela ez niha ji "Peyê Sivik" re bibêjim ku here malê, ji kevaniya malê re bibêje mêvan hene, bila filan xwarinê ji me re çêbike; wê di cî de here malê û ji pîreka min re bibêje.

Hersê bira gelekî şaş mabûn. Kirîna dewaran ji bîr kiribûn û çavên xwe bera kirîna vî kîroşkî dabûn. Birayê mezin ji Rizgo re got:

- Heyran, me gelekî meraq kir. Ji bo vê yekê jî, em dixwazin îşev mêvanê te bin. Ka temiya xwe li kîroşk bike û wî bişîne malê.

Rizgo hate cem kîroşk. Werîsê di stûyê wî de vekir û got:

- Binêre Peyê Sivik! Tu zû bike, bilezîne. Here ji kevaniya malê re bibêje ku mêvan hene. Bila ji

me re elokekî ser jê bike. Birincekê û tirşikê fasûlya
bi ser de. Bila êvarî şîva me hazir he
Piştî wan gotinan, Rizgo Kîroşk berda. Kîroşk
berê xwe da çolê û bi lez ji wan dûr ket. Gava
15

hersê bira dît in ku Kîroşk ne ber bi gund direve,
ji Rizgo pirsîn:

- Baş e. Ji bo çi kîroşkê te rast û rast berê xwe
neda gund û neçû?

Rizgo di bin simêla de kenîya û bersîva wan da:

- Ne hûn "Peyê Sivik" nas nakin. Ew pir bi aqil
e. Ji bo kûçikên gund neyên wî, ew li dora gund
dizîvire û dûre dihere malê.

Ber bi êvarê, Rizgo cotê xwe berda. Wî û hersê
bira berê xwe dan gund. Mêvan derbasî malê
bûn, çi bibînin! Ew xwarinên ku Rizgo ji kîroşk
re gotibû, li ser sifrê hazir in. Kîroşk jî, bi
singekî ve girêdayîye û êmê xwe dixwe.

Hersê bira şaş û mat mabûn. Wan dev ji kirîna
dewaran berdabûn û dixwestin bi çi dibe bila
bibe, vî kîroşkê bikin. Wan dest bi doza kirîna
kîroşk kirin. Gava Rizgo dît ku ew li bazara
kirîna "Peyê Sivik" sor dibin; wî jî bêtir xwe
delalî fikir. Wî dixwest bide nîşandan ku ew naxwaze
kîroşkê xwe bifiroşe. Her sê bira li ber
Rizgo digeriyan û digotin:

- Em sê tucarên pir mezin û zengîn in. Mêvane
me pir deherin û tên. Ji dewsa ku em zêde xulam

û navmaliyan bigrin, em dixwazin vî kîroşkî bikin.

Hema tu çi bixwazî em ê bi te din. Me ji

"Peyê Sivik" pir hez kir. Wê pîrekên me jî

gelekî jê hez bikin. Em mêvanên te ne, ji bo

xatirê mala xwe divê tu me neşkînî.

Piştî wê libergerandinê, Rizgo got:

- Heyran bawer bikin, min tu carî kîroşkê xwe

nedifirot. Lê hûn dest û lingên min girê didin. Ji

16

bo xatirê we û mala xwe, ez ê kîroşko xwe yê li

ber dilê min pir giranbiha ye, bi sed zêrî bidim

we. Lê bila hûn baş bizanibin, eger hûn ne

mêvanên min bûna, min tu carî "Peyê Sivik"

nedifirot.

Hersê bira sed zêr dan Rizgo, birayê biçûk

rahişt kîroşk û hersê bira berê xwe dan bajêr. Ji

kêfa devê wan nedihat hev. Dema ghiştin malê,

werîsekî zirav û rengîn xistin stûyê kîroşk û du

caran ew di riya nava malê û sûkê de birin û

anîn, ku "Peyê Sivik" riya malê baş nas bike.

Dûre şandin pê hemû kesên bi nav û deng yê

bajêr û xwestin zîrekiya kîroşkê xwe nîşanî wan

bidin. Di civînê de, kîroşkê xwe danîn ser maseyekê

û birayê mezin li ber mêvanan ji kîroşk

re got:

- Ya heywanê baqil, ya "Peyê Sivik"! Tu bi lez

here malê. Ji kevaniya malê re bibêje ku mêvan

hene. Bila ji me re ji bo şîvê berxekî şerjêke û

bavêje ber birincê. Qadiyê me ji ecînê pir hez dike. Bila ecînê jî, ji bîr nekin ha!

Piştî wan gotinan, birayê mezin kêroşk ji ser masê daxist û bera sûkê da. Feqîrê kêroşk ji tirsîa direviya vî aliyê sûkê û wî aliyê sûkê. Pir derbas nebû, qelebalixiyek mezin bi dû "Peyê Sivik" ketibû.

Gava qadiyê bajêr ev rewşa dît, bêhna wî gelekî teng bû û bi hêrs ji hersê bira re got:

- Ev çi ye? Ma kesekî din nema, ku hûn henekê xwe bi me dikin! Ji bo ku hûn zengîn in, hûn di ser xwe re çûne. Ma qey hûn li xwe hay nabin,
17

bê hûn çi dikin? Çi heqê we li vî heywanê reben hebû ku we bera nava sûkê da. Ma qey hûn nizanin, wê zarok kêroşk bi kevîran bikujin.

Birayê mezin hinekî mizmizî, hate cem qadî û got:

- Seydayê hêja! Ew çi gotin in, tu dibêjî. Hedê me ye ku em henekê xwe bi kesên mîna we bi rûmet û giranbiha bikin. Hûn kêroşkê me nas nakin. Ew heywanekî pir bîaqil û zîrek e. Navê wî "Peyê Sivik" e. Kesek nikare bigihije wî.

Gava em êvarî çûn malê, hûn dê huner û zîrekiya wî bi çavên serê xwe bibînin.

Bû êvar. Hersê bira û mêvanên wan berê xwe dan mala birayê mezin. Birayê mezin dît ku şîva ji kêroşk re hatibû gotin, li holê ne xuyanê ye.

Gazî pîreka xwe kir û bi hêrs jê re got:

- Keçê ma kanî şîva mêvanan?

Jinika reben haya wê ji mêvanan û şîva wan çênebûbû. Wê gavê birayê mezin fêmkir, ku "Peyê Sivik" nehatiye malê û Rizgo ew xapandiye.

Di dilê xwe de got: "Heger em vê yekê ji te re bihêlin, bila em ne ji dola bavê xwe bin".

Mêvan gelekî aciz bûn û bi xeyd ji malê derketin.

Hersê bira şêwra xwe kirin û biryar dan ku sibê herin ser Rizgo, heyfa xwe ji wî hilînin.

Rizgo jî dizanîbû, ku wê hersê bira werin heyfa xwe. Ji ber vê yekê jî, wî ji niha de haziriya xwe kiribû û feqek nû li ber wan vedabû. Rizgo kerekê dibê ser cot. Çend zêran dixê bin teriya kerê û li benda wan dimîne.

Gava ew tîncem cot, berî ku ew dest bi peyvê
18

bikin, Rizgo ji wan re dibêje:

- Wey hûn bi xêr hatin û ser çavên mm re hatin ya dostên hêja. Lê hayê we ji kerê min hebe; hûn destên xwe nedin wî! Gava hûn dest

19

kerê min bidin, wê zêrê min ji dawiya wî biweşin.

Hersê bira mesela kêroşk ji bîr kirin û ketin meraqa rastî û nerastiya gotinên Rizgo. Yek ji wan hate cem kerê û tepek lêxist. Ker berê hatibû tirsandin. Kerê da zîtoka û çend zêr ji dawiya wê

ketin erdê. Çavên hersê biran çû nava serê wan.
Bê ku gotinê zêde bikin ketin bazara kerê. Lê
Rizgo xwe giran dikir û nedixwest bide diyar
kirin ku ew di-xwaze kerê bifiroşe wan. Piştî bazariyek
dijwar, Rizgo ker bi sed zêrî firot û ji
wan re weha got:

- Binerin! Divê hûn baş li kerê miqate bin.
Şevê olçekek cehê spî bidinê û leganek ava hênik
li ber wî deynin. Divê binê odeya kerê bi xalîçe
be û gelekî paqij be. Gava hûn baş li kerê binerin,
hûn dê her sibe, têra xwe zêran bidin hev.
De hûn û qismetê xwe.

Hersê bira ker dan ber xwe û berê xwe dan
bajêr. Şeva ewilî, birayê mezin ker bir malê. Wî
û pîreka xwe oda mêvanan ji kerê re vala kirin.
Xalîçeyek ecemî liodê raxistin. Olçekek cehê spî
û leganek ava cemidî danîn ber kerê û derî liser
wê kilît kirin.

Bi berbanga sibê re, birê mezin şiyar dibe û
rast berê xwe dide oda mêvanan. Gava devê odê
vedike, çi bibîne! Ode di bin rêxê de maye.

Mirov ji bîhna rêxa rohn nikare serê xwe di
hundur xîne. Xalîçe û dîwarên odê ji rêxê hatine
xemilandin.

Birayê mezin di dilê xwe de dibêje: "Ya baş ew
20

e, ku ez vî tiştî ji birayên xwe veşêrim. Bila ew jî
ji vê "xêr û bereketê" bê par nemînin. Ne weha

be, wê henekê xwe bi min bikin û ez ê li ber wan kêr bikevim".

Birayê mezin gazî pîreka xwe dike. Pîreka xwe baş temî dike. Odeyê xweşik paqij dikin ku birayên wî pê dernexîne bê çî tofan hatiye serê wan. Bîstek derbas dibe, herdu birayên wî tên.

Bi kêf û meroq ji birayê xwe pirsîn:

- De ka ji me re bibêje, bê te çend zêr dane hev?

Birayê mezin, çend zêrên pîreka xwe tîne nîşanî wan dide û dibêje:

- Bi serê bavê min hew ev çend zêr tenê min dan hev. De qey qismetê min ewqas bû.

Birayê navîn ker da ber xwe û bir malê. Ew tiştê hatibû serê birayê mezin, hate serê birayê navîn jî. Lê wî jî nexwest ku vê yekê ji birayê xwe yê biçûk re bibêje. Bi wî awayî birayê biçûk jî ji wê "xêr û bereketê" bê par nema. Birayê biçûk ji herdu birayên xwe re got:

- Hey malxerabino! Ma hûn ji Xwedê natirsin, ji evda jî fedî nakin? Em dê kengî weke birayên xelkê bi hevdu re rast bimeşin? Ma we mala xwe di bin rêxê de hişt, çima we ev tişt ji min re negot? Ma min çî tade û xerabî bi we kiribû? Hema ez çî bibêjim bê feyde ye. Mala we ne ava û biratî ne heqê we.

Piştî bîhna birayê biçûk hinekî hate ber wî, hersê bira bi hevdu şêwirîn. Tevdîra xwe kirin

yek. Biryar dan ku vê carê Rizgo bikujin; heyfa
21

Kevin û nuh jê hilînin.

Rizgo jî dizanîbû, ku wê hersê "birakên" wî werin. Çavên wî li riya wan bû. Lê tevbîra xwe jî, ji niha de girtibû. Wî feqa xwe ya vê carê weha ji pîreka xwe re dida diyar kirin:

- Ez ê hinek xwîn di torbakî naylon xînim û wî torbeyî di binê kitana te de veşerim. Gava ew hatin, ez ê tiştêkî ji te bixwazim. Lê tê serhişkiya bikî û wê daxwaza min pêk neynî. Ez ê xwe biqehêrînim û kêrê bidim ser qirika te. Torbe wê biqete û xwîn wê bi ser qirika te keve. Dûre ez dê li bilûrê xînim û tê rabî ser xwe û bireqisî. Bi wî awayî ez ê bixwazim ku ew mesela kerê ji bîr bikin û ew li kirîna bilûrê sor bibin.

Rizgo tevna xwe ya nû li dar xistibû û çavên wî li riya her sê bira bûn. Gava her sê bira ketin mala Rizgo, ew ji ber wan rabû û bi qêrîn gazî pîreka xwe kir û ji wê re got:

- Keçê zû were! Mêvanên me yê ezîz hatine. Kulavêkî nû ji me re raxîne û zû çayek bi dem ji me re çêbike. Niha mêvanê me betilîne.

Weke ku li hevdu kiribûn, Binevşê rû neda mêvanan û di ber xwe de got:

- Ne bi xêr û ne bi selamet! Ma qey ez ji kar û suxrên mêvanên te xelas nabim. Her roj mêvan, her roj mêvan ...

Hîn Binevşê peyva xwe tamam nekiribû, hema Rizgo rabû ser xwe, rahişt kêra malê, bi serê pîreka xwe girt, avêt erdê û kêr da ser qirka wê. Torbê xwînê teqiya û xwîna sor li kitana spî zû veda. Hersê bira şaş û mat mabûn. Yekî ji nav 22

wan got:

- Hey malxerab, ma mirov ji bo diltengiyek weha biçûk pîreka xwe dikuje!

He rsê bira şaş mabûn û nizanîbûn bê çî bikirina. Ji fedya serê xwe bera ber xwe dabûn û diponijîn. Birayê mezin vegeriya ser herdu birayên xwe û bi dengekî nizim ji wan re got:

- Xwedê bela xwe dayê. Tişteki em bikin nema. Ya baş ewe, em dev ji wî berdîn û herin malka xwe.

Hîn wan weha şêwra xwe dîkir, Rizgo gazî qîza xwe kir û got:

- Keçka min, tu wê bilûrê ji bavê xwe re bîne! Diya te dîsa serhişkî kir. Bi zorê bîhna min teng dîke.

Gava Rizgo dest bi lêxistina bilûrê kir, pîreka wî Binevşê rabû ser xwe û reqisî. Hersê bira dîsa şaş û mat mabûn. Lê di ber xwe de gotin:

- Bi hersê navê Xwedê, ev bilûr ji me re pir baş e. Jinên me serhişk in. Xwe pir delalî dîkin û ji me jî zêde natirsîn. Em dê her yekê carekê wan ser jê bikin, dûre li bilûrê xînin û wan sax

bikin. Bi wî awayî em dê hinekî çavên wan bitirsînin. Eger ew hinekî netirsin, bi wan re nayê qedandin.

Teva ku bi dengên nizim bi hevdu re dipeyvîn jî, dengên wan dihat Rizgo. Birayê mezin doza kirîna wê bilûrê li Rizgo kir. Lê Rizgo xwe li firotina bilûrê nedikir xwedî û weha digot:

- Heyran, hûn dibînin ku jina min pir serhişk e. Gava ew serhişkiya dike, bîhna min zû teng dibe.

23

Eger ne ji vê bilûrê ba niha min jina xwe zû de kuştiba. Ez ditirsim ku bê bilûr jî, ez rojekê biqehherim û pîreka xwe ser jê bikim. Ji ber vê yekê, ez naxwazim bilûra xwe bifiroşim.

24

Hersê bira liber Rizgo geriyan û gotin:

- Divê tu vê qencyê bi me bikî. Jinên me gelekî serhişk û pozbilind in. Mêvanên me pir tîn û her car ew me li ber mêvanan fedîkar û rûsar derdixînin. Bi saya vê bilûrê, em dê wan hinekî bitirsînin. Bi soz û peyman, eger tu bixwazî, dûre tu dikarî bilûra xwe paşde bigrî. Bi wî awayî li hevdu kirin û Rizgo bilûr bi sed zêrî firot wan.

Roja ewilî, birayê mezin bilûr bir malê. Li pîreka xwe mana geriya. Di dawiyê de, bihna xwe teng kir, bi qirika pîreka xwe girt avêt erdê û bi kêrê qirika wê birî. Xwînê pijiqand ser

çavên wî û pir derbas nebû jinikê can da. Piştî bîstekê rahişt bilûrê û lê xist. Lê jinik ranebû ser xwe. Dengê bilûrê bilindtir kir, lê dîsa jinik ranebû ser xwe. Ew bi tepan bi xwe ket, lê êdî feyde nedikir. Wî çalek mezin di xanîkê kewaran de kola, meytê pîreka xwe xist wê çalê û di ber xwe de got:

- Ya baş ewe, ku birayên min pê nehisin. Bila ew jî wek min ji vê "xêrê" bê par nemînin. Ne weha be, wê kêfa wan li min were û wê henekê xwe bi min bikin.

Roja din, birayê navîn tê û ji birayê xwe dipirse:

- Ka tu ji birayê xwe re nabêjî, bê feyda bilûrê bû ya na?

- Çawa nebû! Bi hersê navê Xwedê, hîngî pîreka min tirsiyaye, ew newêre were hundir. Bûye weke şima yê.

25

Birayê navîn jî, bi wî awayî pîreka xwe şerjê dike. Lê ew jî, ji birayê xwe yê biçûk re nabêje. Birayê biçûk ji weke herdu birayên xwe pîreka xwe ser jê dike.

Piştî ku hersê bira pîrekên xwe bi wî awayî dikujin, êdî rohnî di çavên wan de namîne. Soz û peyman didin hevdu, ku vê carê çî dibe bila bibe, divê Rizgo ji destên wan xelas nebe.

Birayê biçûk gelekî qeherîbû û ji herdu birayên xwe re got:

- Bi her sê navê Xwedê, vê carê jî hûn werin lîstika Rizgo, ez dê bi destê xwe we bikujim. Ma çend û çend ji destê vî segbavî.

Piştî sê rojan, Rizgo çavderiya her sê bira dikir. Wî baş dizanîbû ku piştî sê rojan wê hersê bira werin ser ruhê wî. Loma jî, fen û feqa xwe ya dawî hazir kiribû. Rizgo ji pîreka xwe re got:

- Tu dizanî wê her sê bira werin ser min û bixwazin heyf û tola xwe ji min hilînin. Ez bawer im ew niha gelekî tûre bûne û wê bixwazin vê carê di cî de min bukijin. Divê ez jî lîstikek weha bînim serê wan ku êdî nikaribin derkevin nava civatê û di heyata xwe de ji bîr nekin. Em dê gorekê li nava goristana gund bikolin. Taqekê di wê gorê de bihêlin. Ez dê bi gûzanekî berbera têkevim gorê. Gava her sê bira hatin, tê ji wan re bibêjî ku birakê wê do çû rahmetê. wî di ber mirinê de wesiyet kir ku hûn herin ser gora wî. Taqek di gorê de vekirî hiştiye. Serê xwe di wê taqê xînin, çend ayetan li ser bixwînin û wî bêhn bikin. Belkî bi xêra duayên we gunehên wî

26

hinekî sivik bibin û Xwedê wî efû bike.

Rizgo û Binefşê çûn nav goristana gund û gorek fireh kolan. Rizgo teva gûzanê xwe kete wê gorê, Pîreka wî taqek di gorê de hişt û ser gorê xweşik girt.

Pir derbas nebû, hersê bira hatin mala Rizgo.

Bi kîn û hêrsek mezin li wî pirsîn. Binefşê bi kelogirî ji wan re got:

- Ma qey we nebihîstiye? Birakê wê do çû ser heqîya xwe, vefat kir. Berî bimre jî, wesiye kir ku hûn herin ser gora wî, serê xwe têxin taqa gorê, çend ayetan li ser ruhê wî bixwînin û wî bêhn bikin. Belkî bi xêra duayên we, gunehên wî hinekî sivik bibin û xwedê wî efû bike.

Her sê bira di ber xwe de gotin:

- Em ê herin ser gora wî. Lê ne ji bo em ayeta liser wî bixwînin. Ji bo em dilê xwe di cî kin; bê bi rastî ew segbav miriye ya na?

Her sê bira dan dû hevdu û berê xwe dan nav goristana gund. Gava çûn ser gora Rizgo, birayê mezin serê xwe xist taqa gorê û got:

- Segbav kurê segbava! Tu ji destên me xelas bû û bi emrê Xwedê mir. Weleh vê carê me dê ruhê te bi destên xwe bistenda. Lê şansa te hebû ku em neghiştin ser te...

Hîn birayê mezin gotinên xwe dawî neanîbû, Rizgo bi pozê wî girt û di ber de jêkir. Birayê mezin destê xwe da ser pozê xwe, nexwest ku birayên wî bibînin û got:

- Elahûmeselî ela Muhemed. Çi bêhna cinetê ji vî bênamûsî tê.

27

Dor hatibû ser birayê navîn. Gava wî serê xwe xist tîrbê, Rizgo firsenda xebera nedayê. Hema bi

bêvila wî girt û gûzan avêtê. Wî jî destê xwe da ser bêvila xwe û weke birayê xwe yê mezin got:

- Elahûmeselî ela Muhemed. Bi rastî jî bîhna bihiştê ji vî kûçikbavî tê.

Birayê biçûk jî serê xwe xist taqê û çend xeber ji Rizgo re dan. Rizgo bi bêvila vî jî girt û di ber de jêkir. Birayê biçûk vegeriya ser herdu birayên xwe û ji wan re got:

- Lawo, malxerabino, bêbextino! Ma çî doz û dawa we bi min re hebû ku we ev bêbexû bi min kir. Jixwe, ji ber ku em bi hevdu re ne rast in, em weha bêbext in ku ev bela û tofanî hatin serên me. Taliya talî, me bêvilên xwe jî li ser kir. Ma em dê bi çî rûyî derkevin nava civatê?

Her sê bira, polîpoşman dan dû hevdu û berê xwe dan malên xwe. Rizgo bi wî awayî heyf û tola xelkê ji wan hila.

28

Rojekê Mîrzo ji bo firotinê, barek êzing dibe bajêr. Êzingê xwe difiroşe, asûkê xwe dikire û dixwaze hinekî linav bajêr bigere. Lê di wê demê de, qolçî hebûn. Wan nedihîştin ku xelk tûtina wê derûdorê vexwin. Ji tûtina Kurdîstanê re digotin "tûtina kaçax". Feqîrê gundîyan gava dihatin bajêr, ji tîrsa qolçîyan xweşikî nikarîbûn cixareyek bi kêfxweşî vexwarana. Dema ku qolçîyan hinek gundî didîtin, bi dû wan diketin. Li ser wan digerîyan û gava tûtin li ser wan bigirtan,

ceza ji wan distendin.

Mîrzo jî weke gelek gundiyên Kurdistanê, ji destên qolçiyên pir kişandibû û gelek caran ceza dabû. Hingî dabû dilê wî, sûnd xwaribû, ku vê carê linav bajêr cixara "kaçax" vexwe.

Gava qolçiyekî dît, ku dûxana cixarê bi ser yê gundî ketiye, bi lez xwe gîhand cem wî. Li ser wî gerîya, barê kerê wî avêt erdê, li nav barê wî gerîya; lê tu tûtîn nedît. Qolçî gelekî aciz bû. Lê nekarîbû tiştek bikira.

Mîrzo barê xwe avêt ser kerê û riya xwe berdewam kir. Piştî sed gavekî ji qolçî bi dûr ket, dîsa dûxan bi ser serê xwe xist. Qolçî bi bazdan xwe gîhand cem wî. Weke cara din li ser wî gerîya, barê wî dîsa avêt erdê, ew ji hevdû xist, lê tu tûtîn nedît. Qolçî gelekî tûre bû. Tu nemabû ji qehra biteqîya. Lê tişt ji destan nedihat.

Mîrzo barê xwe bar kir, qederkî meşîya û dîsa
29

dûxan bi ser serê xwe xist.

Qolçî dîsa bi bazdan çû cem Mîrzo. Helke helka wî bû, bêhna wî çikiya bû. Ji hêrsa bi zorê gotin digîhand hevdu. Qolçî bi libergerandin ji Mîrzo re got:

-Heyran, welleh te kezeba min reş kir. Bi soz û peyman û bi sê telaqên bêfito, eger tu cihê tûtina xwe rê min bidî, ez ê tu cezayî ji te nestînim.

Mîrzo bawerî pê anî, ku qolçî wî tiştî ji dil

dibê. Mîrzo çû cem kerê xwe, tûtina xwe ya ku di nav paçikekê pêçabû, ji guhê kerê derxist û rê Qolçî da.

Qolçî bîhna wî gelekî teng bû. Lê ji bo soz dabû û bi telaqan sûnd xwaribû; tu ceza li Mîrzo nebirî. Piştî çend gavan, Mîrzo dîsa dûxan bi ser serê xwe xist.

30

Serhad bi berbanga sibê re rabû, werqîlên êzingan li ser kerên xwe şidand û berê xwe da çiyê. Di demek kurt de, sê bar êzing jêkir û ket ser riya bajêr.

Kerekî wî gelekî xurt bû, ço ne digîhand xwe û hergav li pêşiyê diçû. Kerê din teva ku ne wek yê pêşî bû; wî jî bargiraniyek mezin ji xwediye xwe re dervedixist. Lê kerê sisêyan, kezeba Serhad reş kiribû. Her sed dused gavî diçû, diket xwarê û mexel dihat. Heta Serhad bi serê xwe barê wî rast dikir û ew radikir ser lingan, piştî wî diket ber wî.

Serhad di dilê xwe de her nifir dikir û sûnd dixwar, ku vê carê kerekî baş ji xwe re bikire. Ji ber ku aboriya Serhad li ser firotina êzingan bû û ev tişt her car dihat serê wî.

Serhad ghişt bajêr, êzingên xwe firotin û berê xwe da xana ku her gav diçuyê. Silav li xwediye xanê kir, her sê kerên xwe bi singan ve girêdan û ber bi çarşiya canbaza çû. Ew li nav kerên ku li

mazatê bûn geriya û yek ji wan kete serê wî.
Kerekî wek bergîrekî bû. Rewşa wî baş xuya
dikir. Ji bo ku, ji kerê xwe gelek tirsiyabû, bazarek
taybetî bi xwediyê kerê re kir:

- Heyran, ez li kerekî baş digerim. Ez her roj
êzingan ûnim bajêr. Rewşa kerê te baş xuya dike,
31

lê dîsa jî dixwazim bazara xwe baş bikim. Eger
kerê te qelp û zexel be, ez ê wî bi şûn de
vegerînim.

Xwediyê kerê bê ku li ser bifikire, bi carekê
bersîva Serhad da:

- Bi Yezdanê jor, tu kerekî wiha xurt û li ser
xwe, zor dibînî. Heta sibê ji te re mohlet û di dilê
xwe de jî got: " Ma tê çawa pê derxînî, ku kerê
min zexel û qelp e. Ev der ne gund e, ku tu barê
êzingan li wî bikî û pê derxînî ku kerê min ne
weke qilafetê xwe ye. Ji xwe, gava tu sibê dîsa
werî bajêr, tu dê min li vir nebînî."

Serhad bêyî ku dirêj bike jê re got:

- Ez bawer nakim ku pêwîst be tu heta sibê
mohletê bi min dî. Eger kerê te qelp û zexel be,
ez dê zû vegerim.

Serhad xatir ji xwediyê kerê xwest û ker ber bi
xanê ve ajot. Demekî dirêj derbas nebû, Serhad
paş de vegeriya, hate mazatê. Hîn xwediyê kerê li
wê derê bû. Ew li bendê bû ku kerên xwe yên
din bifiroşe. Serhad hat cem wî û jê re got:

-Birako, kanî perekên min û ji te re kerê te!

Kerê te him zexel e û him mexel e.

Xwedyê kerê bîhna xwe teng kir û got:

- Ez kerê xwe paş de venagerînim. Kerê min kerekî gelekî xurt e. Ma tu lê nane rî, ew weke qantirekî ye. Tu bi çi awayî dikarî vî tiştî ji bo kerê min bibêjî?

-Heyran ne pêwîst e, ku em serê hevdû biêşînin. Kerê te ne li gor qilafetê xwe ye û ne jî weke ku tu pesnê wî didî ye. Kanî perekên min.

32

33

Ez naxwazim derûdor dengên me bibihîzin û ne lazim e, ku ez te bikşînim heqiyê.

Xwedyê kerê bewerî pê anî, ku ew ji destê

Serhad nafilite. Lê di dilê wî de jî bûbû kuL.

Gelo, bi çi awayî Sehad tê derxist, ku kerê wî

qelp û zexel e? Xwedyê kerê vegeriya ser

Serhad û ji wî re got:

-Baş e. Ez dê perên te bidim. Lê bi şertekî.

Divê tu ji min re bibêjî, bê te bi çi awayî tê derxist,

ku kerê min qelp û zexel e.

Serhad hinekî mizmizî û bersîva pirsê wî da:

- Eger ev be, ev gelekî hêsan e. Sê kerên min

hene û niha li xanê girêdayî ne. Yek ji wan gelekî

xurt e, ço nagihîne xwe. Yek jî ne weke yê xurt

e, le ne pir xerab e jî. Lê yê sisêyan him zexel e

û him mexel e. Her gava ku ez wî tînim bajêr,

kezeba min pê re reş dibe.

Gava min kerê te bir xanê; pêşî kerê te û yê min yê herî xurt hevdu bîhn kirin. Demek dirêj derbas nebû, wan paşiya xwe dan hevdu û bi zîtokan hatin hev. Dûre, wî û kerê min yê duyem hevdû bîhn kirin. Wan jî li hevdû nekirin û paşiya xwe dan hev. Lê gava dor hat ser kerê min yê siyem, yê ku him zexel û him mexel e; te digot qey ew destbirakên hevdû yên eskeriyê ne. We gavê min tê derxist, ku kerê te ji sefê kerê min yê zexel û mexel e.

Serhad perên xwe paş de girtin, xatir Ji xwediye kerê xwest û berê xwe da xanê.

34

Suphî û Hemo destbirakê hevdu bûn. Suphî bajarî bû, Hemo jî gundî bû. Herdu heval dadikevin beriyê ku ji xwe re karekî bibînin. Li gundekî beriyê limalek xewle dibin mêvan. Piştî şivê, herdu destbirak bi mazûbanê xwe re diherin odeya gund ya Hecî Hadî.

Li odeya Hecî Hadî, weke her şev civat baş geriyabû.

Navmaliyê Hecî Hadî qahwa tahl li gundiyan digerland. Ji dûxana cixaran mijek tenik

xwe bera ser civatê da bû. Her sê zilaman silav li civatê kirin, çend kes ji rêza pêşiyê rabûn ser xwe û cih dan wan. Hacî Hadî xêrhatin di wan hilda û ji mazûbanê wan Êso pirsî:

- Êso! Ma mêvanên te ji ku ne?

- Ez benî, yek ji wan bajarî ye û camêrê din ji deştê ye. Ew ji xwe re li karekî digerin.

Hecî Hadî ji wan pirsî:

- Gelî camêran ma çi kar ji destên we tê ?

Yê bajarî got:

- Axayê min, ez dikarim hewşê bimalim û karê nav malê bikim.

Hemo jî got:

- Ez benî, weleh min bi sala gavantî kiriye.

Eger gavanek ji we re lazim be, bawer bikî ez nayê şekala haziran, lê yekî mîna min zehmet tê dîtin.

35

- Baş e. Lê bazarek min heye: Roja we her yekî bi nîv qurişî. Yek ji we rêxa êxur bavêje û yê din jî here ber çêlekê.

Bazar hate qebûl kirin. Sohbeta civatê bi serpehatî û pêkenînên gundiyan berdewam kir.

Bi berbanga sibê re, Hemo çêlek ji êxur derxist û berê wê da çolê. Suphî jî rahişt bêrê, selikê,

36

melkesê û daket êxur. Lê çi bibîne! Axur heta ber beşta tije zibil e. Qudûmê wî şikest û baweriya xwe pê anî, ku bi kişandinê ev kar naqede.

Lê teva vî awayî jî mecbûr bû, ku dest bi kişandina zibil bike.

Rewşa Hemo, ji ya wî ne xweştir bû. Ohoo

37

ohoo ya wî bû û bi dû çêlekê de dibezîya. Lê,
dikir û nedikir nedigîhişt çêlekê. Di Pinnîrê re,
di gundê Hecî Elî re, di Şêxê Reş re û di Kilêbînê
re vejeriya Girbeşkê û hat Salikê. Hemo hingî
westiya bû, ji hal de ketibû. Xwêdanê di pişta wî
re avê-tibû, ziman di devê wî de zuha bûbû û
xweziya xwe bi zorê dadîqurtand. Wî di dilê xwe
de got: "Ez ê sibê yê bajarî bişînim ber çêlekê."
Suphî jî di dilê xwe de di got: "Ez ê sibê birakê
xwe Hemo di ber vê rêxê xînim. Bila ew jî, ji vê
xêr û berekêta ku ez tê de mame, bê par
nemîne."

Bi êvarî re Hemo çêlek di ber de, ket devê
deriyê hewşê. Suphî baz da pêşîya wî û jê pirsî:
- Tu bi xêr hat birako. Ma karê te çawa bû? Tu
pir betilî xuya yî.

- Na weleh. Bi serê te ez xenê bûm. Li wan
mêrgan û li ber wan çeman ez di xêra Xwedê de
mabûm. Ma gelo tu di çi halê de bû?

Suphî di bin simêla de dikeniya û li birakê xwe
vegerand:

- Weleh, ez wek tiralên Bexdayê li ber siya
êxur rûniştim û min tu kar nekir.

Hemo jê re got:

- Baş e, birako. Ez ê sibê jî herim ber vê
çêlekê. Lê dusib dora te ye.

Wî bi vî awayî dixwest, ku Suphî li çûna ber
çêlekê bêtir sor bike. Gava Suphî ev gotin bihîst,

di dilê xwe de got: "Ahaa, bi Xwedê firset dike ji destên min here. Çavê vî kuçikbavî lê ye, ku ez sibê jî di nav vê rêxê de vegevîzim". Loma jî, bi 38

dengêkî liberger ji Hemo re got:

- Na, bi serê te yê delal, ez tu carî wanî qebûl nakim. Ez di vî hundirî de, ji betaliyê aciz bûm. Tu jî hinekî betilî xuya yî. Tu sibê ji xwe re heta êvarî li ber siya êxur pal de. Divê ez jî hinekî kar bikim. Ma em birakê hevdu yên çî ne ?

Hemo weke yekî ku dilê wî bi Suphî bişewite û bixwaze qencyekê pê bike, got:

- Baş e. Lê, başbazirganê salê wê sibê were ser kaniyê. Kaniyak li vê jorê ye. Min soz daye wî ku ez ê barek êzing li pişta xwe bikim û jê re bibim. Ew jî wê zêrekî bide min. Roja me her yekî bi nîv qurîşî ye. Bi vî pereyî, em ê çî xweliyê li serê xwe kin. Eger tu vê soza ku min daye başbazirgan bi cih bînî, xem nake; wê gavê tu dikarî sibê herî ber çêlekê.

Serê sibê, Suphî li derdora hewşê geriya, lê tu êzing nedît. Gazî hevalê xwe kir û rewş jê re got. Hemo ji wî re got:

- Lawo, Suphî! Ka tu êzing nexuya ne. Eger em êzingan ya jî di dewsa wan de tiştêkî şewatê negihênin başbazirgan, divê em wî zêrî ji bîr bikin. Ya baş eve, bê ku kes me bibîne, tu deriyê hewşê ji ber bikî û ez ê bi werîsekî li pişta te

bijdînim. Derî di dewsa êzingan de bibe.

Suphî deriyê hewşê ji ber kir. Hemo ew bi werîsekî li pişta Suphî baş şidand. Çêlek ji êxur berda û ji birakê xwe re got:

- Riya te vekirî be. Tu li çêlekê baş miqate bî ha!

Yê bajarî derî li piştê da dû çêlekê. Lê, rebeno 39

dikir Û nedikir nedigîhişt wê. Çêlekê weke her gav berê xwe da riya gundan û belengazê Suphî jî her bi dû wê de baz dida. Gelek derbas nebû, feqîro ji hal ket. Ji tirsê ku çêlekê wenda bike, nekarîbû ji dû wê jî vegere. Hêdî- hêdî hişê Suphî hat serê wî ku bê birakê wî çî aniye serê wî.

40

Piştî Suphî da ser oxura xwe, Hemo jî bi kêfek mezin berê xwe da êxur, da ku ew jî wek yê bajarî hinekî "tiraliyê" bike. Gava paldana ber siya êxur dihat bîra wî, devê wî diçû paş guhê wî. Bi vê kêf û heviyê gihişt ber devê deriyê êxur. Dema ku serê xwe dirêjî hundir kir, rûyê wî pê re hat guhertin. Çongên wî lerizîn û heft xwezî bi karê xwe yê do anî. Lê ji bêçaretî, wî jî selika xwe da ber rêxê û dest bi kişandina rêxê kir. Bikşîne, ha bikşîne! Heta êvarî pişta wî kete ber wî û di ber xwe de jî her digot:

- Weleh, Suphî efendî rast digot. Maşeleh min liber siya êxur xweş pal daye.

Ber bi êvarî Hecî Hadî ji odê daket hewşê û lê hay bû, ku deriyê hewşê ne li ber e. Bi awakî hêrs û şaşmayî ji Hemo pirsî:

- Lawo Hemo, ma ka deriyê hewşa me ?

Hîn Hemo difikirî, ku çî bersîvê bide, Suphî derî li pişta wî û ziman ji dev kişyayî bi dû çêlekê de ket hewşê. Hecî Hadî nema dizanîbû bê çî qewimî ye. Ji Suphî pirsî:

- Kuro, ma tu dîn bû yî, ev çî derî ye lipişta te ye?

Yê bajarî ji hêrsa peyv nedigîhandin hevdu û bi zorê bersîv da:

- Axa, ez xulam, ji xwe îmana min hatiye serê bêvila min. Çêleka te ez gund bi gund gerandime. Ez bûm şadîkê şivan, gavan û bêrîvanên çolê. Hevalê min mala min xerab kir. Mêrg û kaniyên wî serê wî bixwe.

Suphî derî ji pişta xwe danî, çêlek bir êxur, ew
41

bi singekî ve girêda û vegeriya odê. Wî ji westiyane ta girtibû û xwe li ser kulavê odê dirêj kiribû. Hemo ji fedya nizanîbû bê çî bibêje. Taya hevalê xwe kir mane û ji Hecî Hadî re got:

- Heyran tu dibînî ku hevalê min nexweş e. Ez pir ditirsim ku ev mêrik livir, di nav lepê me de bimre. Ya baş, tu perekê me bidî me. Em dê sibê heta nîvro jî, ji te re bixebitin. Dûre, eger tu destûra me bidî, ez ê birakê xwe bibim mala wî,

nav zarokên wî.

Ji xwe Hecî Hadî jî gelekî ji wan aciz bûbû û ji

Hemo re got: -

- Karê we serê we bixwe. Ji we re du quriş û nîvê we û ne pêwîst e, ku hûn heta nîvro jî bixebitin.

Destûra we bi we re û sibê ez we li gund nebînim!

Herdu heval, bi berbanga sibê re ji Salikê derketin.

Bi rê de perê xwe li hev parê kirin. Her yekî qurişek girt. Lê nîv quriş di navparê de ma.

Ji ber ku perê hûr tunebû, her yekî nedikarîbû deh perê xwe bigirta. Suphî ji Hemo re got:

- Birako! Gava em bighêjin bajêr, ez ê vî nîv qurişî hûr bikim û deh pera bidim te.

Bi vî awayî li hev kirin û riya xwe domandin.

Bi rê de, li bîrekê rast hatin. Li ber bîrê sekinîn.

Hemo ji Suphî re got:

- Birako, baş bû ku em li vî bîrê rast hatin. Ji tîna qirika me zuha bûbû. Divê yek ji me dakeve binê bîrê.

Yê bajarî got:

- Weleh, ez newêrim dakevim binê bîrê. Ka tu

42

43

pişta xwe veke. Em dê pişt û desmalên xwe bi hevdu ve girêdin û ez ê te daxim binê bîre. Tu tîr avê vexwe, kumê xwe jî ji min re tije av bike, dûre ez ê te bikşînim jor.

Destmal û piştên xwe bi ser hev girêdan, kirin
wek werîsekî û Hemo xwe bera binê bîrê da.

Dema ew gîhişt binê bîrê, çi bibîne! Sindoqek tije
zêr û mecîdî di binê bîrê de ye. Hemo tîbûna xwe
ji bîr kir, rahişt sindoqê û ji hevalê xwe re got:

- Birako, em tê de man. Min sindoqek tije zêr û
mecîdî dît. De min zû bikşîne jor!

Gava Hemo bi rûkarê devê bîrê ket, yê bajarî
dada sindoqê û hevalê xwe bi şûnd de dahf da,
bera binê bîrê da. Hemo di dilê xwe de got: "Te
dît min bi destên xwe çi anî serê xwe".

Bi zehmetiyek gelek mezin Hemo ji bîrê
derket. Roj çûbû ava. Dinya hedî hêdî tarî dibû.
Li derdora xwe nerî, kesek nedît. Ji xwe re got:
"Ya baş ewe, ku ez weke kera bizirim, hela bê
ev segbavê Suphî limin venagere."

Hemo dest pê kir weke kera ziriya. Gava dengê
zirandina "kerekî" hate Suphî, gelekî kêfa wî hat
û ji xwe re got:

- Weleh ev pir baş bû. Ez pir betilîme. Waye
kerek tê. Hem ez dê li wî siwarê û hem jî ez ê
sindoqa xwe lê bikim.

Wexta ku ew nêzîkî hevdu bûn, Suphî lê nerî
ku birakê wî ye. Hemo çend xeber jê re dan. Lê
yê bajarî li ber dilê wî geriya û li hev hatin.

Paşê, sindoqa xwe vekirin û zêr û mecîdiyên di
sindoqê de bûn, li hev parê kirin. Piştî xatir

xwestinê, Suphî berê xwe da bajêr û Hemo jî
berê xwe da gundê xwe.

Hemo bi xêra wan peran, bû zengînê gund.

Lê, destên xwe li peran negirt û bi bolvirî vir de
wê de avêt. Bi vî awayî, dawiya peran zû anî.

Dema ku zivistanê devê derî girt, qurişek pere li
45

mala wî nemabû. Ew û pîreka xwe bi ser hevdu
de ponijîn. Bîstekê wiha man û dûre pîreka wî
bêdengî xera kir û ji Hemo pirsî:

- Mal şewitiyo, ma ewqas perê te hebûn. Te
hemû çawa kir? Ma qey tu deynê te li kesî
tuneye, ya jî tu birak û dostên te yên ku bikaribin
vê zivistanê li ber barên me rabin nînin?

Ji nişka ve deh perê wî yê li bajarî mabû hat
bîra wî û bi kêf ji pîreka xwe re got:

- Ha ha, hat bîra min. Deh perê min li yê bajarî
mabû. Ez ê îro herim bajêr, perê xwe ji cem wî
bînim.

Hemo ji malê derket û berê xwe da bajêr. Li
bajêr, li mala birakê xwe pirsî. Birakê wî gelekî
zengîn bûbû. Yekî, dikanek ne serî û ne binî rê
Hemo da û got:

- Ev dikana birakê te ye.

Lê, birakê wî bi xwe ne li ber dikanê bû. Karkerek
lidikanê dixebitî. Wî da pêşiya Hemo û ew
bir ber deriyekî mezin. Bi şiklê lêxistina derî,
Suphî ket şikê û ji pîreka xwe re got:

- Xanim hela binêre, bê ew ne hevalê min yê gundî ye? Deh perê wî li min bû. Ez bawer im, ew hatiye perê xwe. Ji wî bipirse, heger ew be, bêje birakê te mirî ye.

Jinik hate devê derî û ji Hemo pirsî. Piştî ku jinikê nas kir ku ew birakê mêrê wê ye, kelogirî bû û jê re got:

- Ma ne birakê te mirî ye.

Mêrik dizanîbû, ku ew dek û dolab in. Wî birakê xwe baş nas dikir. Loma jî, ji jinikê re
46

got:

- Xwakê, tu ji kerema xwe re derî limin vekî.

Hema qet nebe ez kincên wî an jî nivînê wî bibînim. Bi kêmanî, niha bêhna wî jê tê. Jinik bi lez vegeriya û ji mêrê xwe re got, ku birakê wî weha dibê.

47

Suphî li pîreka xwe vegerand:

- Derî li wî veke, bila were hundir. Ez dê weke miriya di nav nivîna kevîm.

Suphî xwe wek termekî di nav nivîna de ramedand.

Hemo hat ber serê wî rûnişt û di guhê wî de got:

- Kuro, ka rabe ser xwe û deh perê min bide min. Ma ne şerm e, ku ji bo deh pera te xwe xistiye nav nivîna? Ma qey ez te nas nakim. Tu ewqas zengîn bûyî, lê dîsa jî çavên te birçî ne.

Hemo destê wî bilind kir, Suphî ranebû. Lingên wî bilind kirin, ranebû. Derzî di wî de rakir, lê dîsa feyde nekir. Bîhna Hemo teng bû, derket ser balkonê, ku cigarakê bikşîne. Gava ew li ser şaneşînê bû, lê nerî ku Ebdulxefûr Efendiyê ku miriyan dişo di kuçê de derbas dibe. Bi dengê bilind gazî wî kir:

- Ebdulxefûr Efendî! Ebdulxefûr Efendî! Miriyekî me heye. Ma tu wî naşo ?

Ebdulxefûr Efendî li Hemo veşerîya, serê xwe ber bi şaneşînê bilind kir û got:

- Çima ez neşom. Ma karê min çi ye?

Herdû hatin hundir. Suphî liser textekî daîn û dest bi şuştinê kirin. Tasek ji ava kelandî lê dikirin û yek sar jî bi ser de dadikirin ...Deng ji dîwêr derdiket, lê ji Suphî dervediket. Hemo di nav re jî, bi bergerandî ji wî re digot:

- Lawo, weleh tu sax î. Me tu bi saxî kuşt. Rabe ser xwe, deh perê min bide. Dereng e, bû êvar .Divê ez herim malê. Lê, dîsa tu bersîv negirt û Suphi her xwe li mirîû datanî. Hêviya Hemo her 48

ku diçû qels dibû. Suphî şuştin û xistin nava kefen. Dûre, Hemo ji pîreka wî re got:

- Birakê min wesiyeta xwe li min kiribû. Gorî wesiyeta wî, divê ez wî di naoza binya bajêr de veşenm.

Ebdulxefûr Efendî jî got:

Weleh, ev fikrek ne xerab e. Ji xwe zivistan e û kolandina erdê jî pir zahmet e.

Hemo, birakê xwe avêt ser milê xwe û berê xwe da naozê. Hat ber devê naozê û bi kerb û kîn ew avêt binê wê. Dîsa jê re got:

- Lawo, rabe ser xwe. Weleh ez dizanim ku tu ne miriyî. Deh perekê min bide min, ez herim mala xwe. Lê, dîsa jî tu deng ji Suphî nehat. Hîn Hemo heviya wî hebû, ku birakê wî dev ji vê serişkiyê berde; dengê ji ser tahta naozê hat. Gava Hemo zivirî, dît ku komêk însan ketin hundir naozê. Wî ji tirsê, xwe xiste bin "meytê" havalê xwe û li wan kesên ku hatibûn hundirê naozê guhdarî kir.

Ew diz bûn. Wan xezîna dewletê vekiribûn û teva zêr û perên ku dizîbûn hatibûn wir, xwe veşêrin. Yekî di nav wan de, şûrekî nuh ji xwe re kirîbû. Ji kêfa pera re, nema zanîbû wê çi bikira. Ji nişka ve şûrê xwe ji kalan kişand û got:

- Ez dixwazim şûrê xwe biceribînim. Hela bê çiqasî tûj e. Ya baş, ez şûrê xwe li vî mey tî biceribînim.

Ew hat li ser "meytê" Suphî sekinî û şûrê xwe bilind kir ku lêxe, ji tirsê barîni bi Suphî ket.

Xofek mezin kete dilên dizan û bi lez û bez ji

49

naozê baz dan. Yê bajarî rabû ser xwe û ji birakê xwe re got:

- Te dît birako! Min çi xêr û bereket çêkir.

Eger min weha nekiriba, ev pere ne dibûn
qismetê me.

Suphî û Hemo ew pere bi kêfxweşî lihevdu par
kirin. Piştî bîstekê, diz jî li derve li hev civiyan û
ji hev pirsîn:

- Ma ew çi bela bû hate serê me? Kê ji we ev
bêrêti kir?

Yekî ji nav dizan got:

- Remo Hûro bû. Wî xwest, şûrê xwe li miriyan
biceribîne. Ma ceribandina şûrê wî ne li ser
miriyan ba, nedibû!

Piştî diz bi hevdu şêwirîn, wan biryar dan, ku
Remo Hûro vegere naozê û binere bê çi qewimî
ye. Bê bi rastî mirî rabûne ser xwe ya jî hinekan
bi qazî li wan weha kirin! Hevalên Remo Hûro
ew baş tembîh kir û jê re gotin:

- Divê tu herî naozê baş sax bikî û zû vegeî!

Remo Hûro bi tirsek mezin berê xwe da naozê.
Çongên wî dilerizîn, gupe gupa dilê wî bû. Gava
bi tirs serê xwe dirêjî hundirê naozê kir, Suphî
xwe çengî kumê wî kir. Kum ji serê wî kir, da
destê Hemo û got:

- Lawo, ehaa ev jî di dewsa deh perê te de. Ma
tu hîn çi dixwazî?

Ji tirs, ziravê Remo Hûro qetiyabû. Bi bazdan
li hevalên xwe vegeîya. Devê wî li hev geriyabû
û bi zorê gotin ji dev derdiket:

- Lawo bazdin! Lawo birevin! Mirî hemû

50

rabûne. Wan perên me li hevdu parê kirine û her yek deh pere para wî ketiye. Tew yek j ji wan jî

))

bêpar mabû. Kumê min ji serê min kirin û di dewsa deh pera de dan wî.

51

Rojek ji rojan, lawekî Sîno çêdibe. Pîreka wî jê re dibê:

- Sîno, divê tu herî cem xerêt, dergûşekê ji bo lawikê me bidî çêkirin.

Sîno berê xwe dide dikana xerêt. Jixwe, hew xeratek tenê li wê derê hebû. Destê wî hinekî giran û bîhna wî jî gelekî teng bû. Gava Sîno dighêje cem xerêt, silavê lê dike û wê daxwaza xwe jê re dibêje. Berî ku ji dikanê derkeve, perê dergûşê dide xerêt û hinekî jî lava dike, ku dergûşê zû çêbike.

Lê mixabin teva ku Sîno ji çend rojan carekê diçû cem xerêt û jê dipirsî jî, her gav ew dest vala bi ser malê de vedigeriya. Xerat cama bîhna xwe teng dikir û digot:

- Heyran, dibê tu weha li min ecele nekî. Tu dizanî gelek kar liser min heye û ez jî dixwazim ku rojek berî rojekê dergûşa te biqedînim. Ew lawikê ku wê dergûş jê re çêbiba mezin dibe, tê kemala zewacê, dizewice û piştî salekê zarokek jê re çêdibe. Şahî û kêfxweşiyek mezin

dikeve nava mala Sîno. Ji bo torinekî Sîno
çêbûye, ew gelekî bi kêf dilşad e. Dîsa dergûşek
pêwîst e. Pîreka Sîno daxwaza dergûşekê dike.
Lê vê carê ji bo nebiyê xwe. Sîno ji lawê xwe re
dibêje:

52

53

- Kurê min, gava tu hatibû dinyê, min dergûşek
ji bo te danîbû ser xerêt û pereyên wî jî pêşin
dabûye. Tu bi lez here cem xerêt, silavên min jî
lê bike. Maşalê wî ew dergûş çêkiribe.

Lawê Sîno bi kêf dihere dikana xerêt, silavê li
wî dike û dibêje:

- Apo, gelek silavên bavê min li te hene. Gava
ez hatibûm dinyê, wî ji bo min dergûşek danîbû
ser te. Niha xulamê te be, lawekî min çêbû. Ez
hêvîda im ku te ew dergûş çêkiriye.

Xerêt got:

- Xortê delal, weleh hîn min ew dergûş
çênekiriye.

- Apê delal, ez heyrana çavê te me, tê destê
xwe hinekî sivik bigrî û wê dergûşê zû çêbikî. Tu
dizanî zarok bê dergûş nabe...

Gava xort weha got, bîhna xerat teng bû û bi
hêrs ji xort re got:

- Heyran, eger tê jî weke bavê xwe limin ecele
bikî, fermo perê bavê te û ez tu dergûşa çênakim.

54

Rezê mirovekî hebû. Wî ji rezê xwe pir hez
dikir. Cotê rez di wexta wê de dajot. Eşêva nav
rez ji bîr nedikir. wî gelek cûr mêm çandibûn.
Lê mixabin berazek fesidîbû rezê wî û nedihîşt
ew tu tirî jê bixwe.

Gelek caran, ew bi şev li ber rez dima ku wî
berazî ya bigre ya jî bikuje. Lê wê jî feyde nekir.
Xwediyê rez, rojekê çalekê di nava rez de dikole,

'ih ,

~\

~!j~'

~ ~

~

~~~

devê çalê bi hejik û çilo vedişêre, ku beraz  
têkeve wê çalê û bi wî awayî ji wê belayê xelas  
bibe.

Xwediyê rez sibê zû tê nav rez û dixwaze li  
feqa xwe binere. Gava digihêje ser devê çalê çî  
55

bibîne! Ew berazê ku diket rezê wî, di çalê  
werbûye. Ji kêfa devê wî tê ber guhên wî. Hingî  
dabû dilê wî, radihêle darekî dirêj û bi wî darî bi  
beraz dikeve. Di ber xwe de jî dibê:

- Ma tê vê carê bi ku de xelas bibî?

Xwediyê rez bê rawestandî li beraz dixwe .

.. ~

ı/ ' ~.

i  
?  
~

Çiqasî lê dixê jî, dilê wî rehet nabe. Lê dûre,  
lingên wî dişemitin û ew jî dikevê çalê, cem  
beraz. Ew ji beraz ditirse û beraz jî, ji wî. Beraz  
xwe ber bi jor çeng dike ku xwe bi ser derê çalê  
xîne. Xwediyê rez jî, her ku beraz xwe çeng  
dike, destê xwe dide bin wî, bilind dike û di ber  
de jî dua dike:

- Yarebî tu vê carê jî li vî heywanê bêguneh  
bihata rehmê! Yarebî tu vê carê jî li vî heywanê  
reben bihata rehmê...

56

Rojekê tahsîldarek dihere gundekî berîyê. Ji  
tirsê her yek bi aliyekî ve direve. Ji ber ku di  
wê demê de qaçora serê terş û heywanan hebû.  
Gundîyên feqîr bi kotekî xwe xwedî dikirin. Ew  
qaçor ji wan re gelekî giran dihat.

Weke her car, gundiyan vê carê jî terş û heywanên  
xwe bi lez û bez ji nav gund derxistin. Ew  
lipaş girikan û di çem de veşartin.

Lê mixabin vê carê xeber dereng digihêje  
Çelo, Ji bo wê jî, nagihê ku kerê xwe ji nav gund  
derxîne.

Çelo ji bo qaçora kerê nede, dihere êxur, kerê  
ji êxur derdixîne~ tîne aliyê malê û her çar lingên  
kerê bi veirîsekî baş girêdide. Doşekêkê davê

erdê~ kerê dixê nav û lihêf ekê davê ser.  
Tahsîldar mal bi mal digere. Çi heywanên ku  
dibîne, qaçora wan bi zor ji xwediyê wan distîne.  
DIOr tê ser mala Çelo. Ew ji tirsê dikeve hev.  
Lê naxwaze vê tirsê xwe bide xwiyanê kirin.  
Tahsîldar li hewşê, axur û xanîkê êgir digere,  
lê tiştêkî nabîne. Ew derbasî aliyê malê dibe, li  
we derê jî tu heywanan nabîne. Gava ew dê ji  
malê derkeve, lê hayî dibe, ku kesek di nav  
nivîna de ye. Tahsîldar dizane, ku însanek bi roj  
di nav nivîna de be, tê wê manê ku ew kes  
nexweş e. Ji bo wê jî, tahsîldar ji Çelo dipirse:  
- Xêr e, ma ew kî ye nexweş e?

57

Çelo bi dengêkî melûl dibêje:

- Heyran, weleh ew bavê min e.

Tahsîldar dihere ser nivîna, dixwaze li rewşa  
yê nexweş binêre û dibê:

- Hela ez li apê xwe binêrim, bê çawa ye.

Gava Tahsîldar lihêfê radike, çî bibîne! Kerek  
di nav nivîna de ye. Dibe tîq- tîqa Tahsîldar. Ew  
dizivire ser Çelo û dibê:

- Heyran, ji bona ku ev camêr bû bavê te û apê  
min, bi Xwedê ez jî qaçora vî ji te nastînim.

58

Apê Qado mirovekî jîr û zana bû. Di dema wî  
de, erebe pir tune bûn. Gelek gundiyên wî, hew  
gava cuzdanê xwe yê nifûsê derxistibûn, qeza

xwe dîtibûn. Piraniya wan tu bajarên mezin nedîtibûn. Ji salê carekê ya jî du caran hinek ji gundiyan diçûn qezê û asûkên hemû gundiyan dikirîn. Cama jî, kaçaxçiyên ji bo firotinê cil û caw ji Binxetê dianîn gundan û gundiyan pêwistiyên xwe ji wan dikirîn.

Lê Apê Qado ne weke gundiyên din bû. Kêfa wî gelekî ji gerê re dihat û ew çûbû gelek bajarên mezin. Heta ew çend caran çûbû Enqere û Stenbolê jî. Her cara ku Apê Qado ji bajarên mezin vedigeriya, gundî li wî kom dibûn û wî jî serpehatiyên xwe ji wan re digot.

Carekê Apê Qado dihere Enqerê, li wê derê gramafonê dibîne. Kêfa wî gelekî ji gramafonê re tê û yekê dikire. Heta wê çaxê jî, hîn gramafon nehatibûn navçeya Apê Qado. Mirovên li wê derê tiştêkî weha neditibûn.

Gava Apê Qado ji Enqerê tê, bihar bû. Erd ji giha, nefel û çiçekên biharê hatibû xemilandin. Ji aliyekî şivan, gavan û berîvanan, ji aliyê din jî terş û dewarên wan xeml û xêza biharê dewlementir dikirin. Zarokên gund li derûdora çem li qîvar û kerengan digeriyan. Hinekan jî di nava zadan de baqil didan hevdu.

59

Berî ku Apê Qado bigihêje gundê xwe, gramafona xwe li ser kerekê baş dijdîne, sêlikekê dide ser û gramafon dest bi muzîkê dike. Ew hinekî ji

dûr ve dide dû kerê û dimeşe. Gava şivan, gavan,  
bêrîvanên li çolê dibînin ku kerek tê û distirê, şaş  
û mat dimînin. Ji ber ku heta wê gavê jî, wan  
tişteki weha nedîtibûn. Gotin û nesîhetên melên  
wan tên bîra wan û bawer dikin ku tercal rabûye.  
Her yek ji tirsî bi aliyekî ve direvin û dikin gazî:  
- Hewarê tercal rabû, hewarê tercal rabû...

60

\*\*

## HÊSIR Û BARAN

Wêşanên Jîna Nû : 10

Edebiyat : 1

Çapa yekem : îlon, 1986

Adres:

Jîna Nû Förlaget

Post Box : 240 12

750 24 UPPSALA

Postgiro : 50 37 99-9

ISBN: 91970747-56

Diyariji bo:

Herdu xivşên min; Nazê û Dariya û  
ez hêvîdarim, ewê xwe di "Xoşnav"  
de nebînin.

Bavê Naze

NAVEROK

Pêşgotin 7

Navê Min Xoşnave 12

Wê Kengî Bê 19

Xaniyê Vala - 23

Rûreş .. 28,

Hêsir û Baran ... 36

Windayo 38

Serpêhatiyên Kalo

Şaîroko 48

Serxweş 53

Bîstikek Bê Rûmet ., 60

### PÊŞGOTIN

Heger em bala xwe bidin dîroka (mêjuwa) wêjeya Kurdî ji dema E.Herîrî ta roja îro, wê tiştek tenê bi xurtî li ber çavên me diyar bibe. Piraniya cihok (rûbar) û çemên ser riwê zemîna wêjeya Kurdî derhatine ji kanî û çaviyên şîrî. Lê gelo kengî dar û mêwên prozê (nesrê) di gulistana wêjeya Kurdî de peyda bûne?

Bersîva vê pirsê, weke hûn dibînin, ne mecala me ye, ku di vê derheqê de bi awakî fireh bidim, lê di baweriya min de, heger em îstegehên giring ji jiyana peydabûn û pêşveçûna proza Kurdî bi nav nekin, emê nikaribin texmîn bikin rola efrandinên Kurdî yê teze û ne karibin jî cî û nerxê lehengên çîrokên Bavê Nazê nasbikin.

Weke diyar e, mêjuwa meşandina dîrok û çîvanokên Kurdî, bi zarava Kurmancî, ne ewqas kevn e, ew rehê xwe davêje destpêka sedsala bîstan. Lê gelekî mixabin efrandinên wan salan, ta niha nebûn babeta lêkolînek serbixwe û tu kesî ev quncikên tarî ronî nekiriye û ne vejandiye. Ji ber vê yekê, meriv nikare navên hîmdarên ewil jî bîne ser zimên. (1)



Ji xeynî vê yekê, heger em li qonaxa salên sî û çilî binêrin, bê guman, meriv kare navê damezranerekî proza Kurdî toremendî bêje -Ereb Şemo (2), yê ku ta roja îro jî, tê jimartin weke mezintirîn nivîskarê Kurd ên ku bi zarava Kurmancî efrandinên xwe weşandine û heger hineka berê wî jî kerpîçê ewil ê hîmê proza Kurdî danîbin jî, lê tu kesî weke wî bi şarezayî û zanebûn çim û kelemên wî hîmî tekûz nekirine.

Piştî gulvedana efrandinên Erebb Şemo û jindariya rehên proza wî yî toremendî, gulçînên din kifş bûn di zemîna gulîstana wêjeya Kurdî de. Lê piraniya wan negiha rehê xwe berdin, çilmisîn yan jî berê xwe negirtin.

Keda mamosteyê mezin, Cîgerxwîn "Cîm û Gulperî" ku di sala 1948-an de derket, hêviyek mezin di xwe de nimandibû, lê gelekî mixabin, di gel ku şitilek teze bû û di gel ku hatibû avdan bi hêsir û xwîna bikêrhatina gotina Kurdî î bedew, bû weke darek rehên wê li tehtê rast bîn. Vê yekê, ji me re kifş kir, weke berî niha bi demek dirêj ji gelê din re kifş kiribû, wekî ne her cenan û avçiyên wêjeyê her şkaryî li her zemînê karin şîn kin yan darên xwe tede biçînin. Bi kêrhatin û şarezaya Cîgerxwîn î herî bilind di warê şîr û helbestan de xaya û eşkere bûne di warê zanebûna şêw û metodên nivîsandina prozê. Şaxên herî hêja jî di vê "dora wî yî proze de" man ew şaxen şîrî yen pir bedew.

Di salên 50-î de, ji nav wêjezanên Kurd, yen ku zarava kurmancî xemilandin bi bihokên xweyî tamxweş, dîsa navên nivîskarên Kurdên Sovyet eşkere dibe, weke Heciyê

Cindî, Casimê Celîl û hinên din. Lê gelekî mixabin, efrandinên wan kêmnas in ji piraniya xwendevanên Kurd re.

Di salên 60-î û 70-î de, navên nû di nav Kurdan de derketin, yê ku xwe, di warê wejeyê de, li prozê kirin xwedî.

Divê ku bêjim jî, wekî ev qonax tê jimartin weke qonaxek teze di pêşveçûna çande û wêja Kurdî de ji ber gelek sedemên objektîf û subjektîf ku di tevgera azadîxwazî Kurdî de peyda bûn û hiştin bintara civaka Kurdî bi xurtî bê hejandin. Bi ewakî ber bi çav, kovar û rojnamên Kurdî yê vê demê xwîn ajotin laşê proza Kurdî, hêza zimanê wêjeyî (zarava kurmancî) şidandin û xurt kirin. Lê dîsa hemû uştên gulvedana prozê, çîrok û çivanokên toremendî peyda nebûn. Mirov kare foi kurtî rewşa efrandinên vê demeyî hindik bi nav bike wekî tenê bi rûçkên xwe nêzîkayî li qalib û formên çîrokên modern dikirin. Ji nav efrandinên vê demeyî kem, meriv kare van navan bijmêre; Çîroka "Kal" a Dilar, "Kirase sor" a Siyamend; "Mirina Xuşka Min" a M. Bor û hinên din.(3) '

Yekîtiya Sovyet jî di vê demê de navên nivîskarên nû eşkere dibin weke Seîdê Ibo, Emerîkê Serdar, Baboyê Keleş û hwd.

Weke me diyar kir, cihokên nuh û teze dehatin vedan û kolan di zemîna wejeya prozên renga-reng, lê ta roja îro rûçîkên efrandinên proza Kurdî ji kêmasiyên mezin xelasnabin çî di warê lêkirinê de çî di warê babet û metodên nivîskariyê de û çî di varê ziman de. Bi baweriya min ew jî ji ber van sedeman e:

Kêmnaskirina nivîskarên Kurd ji wêjeya Kurdî ya klasîkî re; kêmmarîfeta ji zargotin û zaravên Kurdî re û kêmnaskirina wan ji şêw û metodên nivîsandinê yên gelên cîhanê yên din re. Ev û gelek sedemên din ên obyektîv hiştine gulîstana proza Kurdî ya ser zarava Kurmancî bi şûnde bimîne û avakirina zimanê Kurdî yê wejeyî û yekgirtî bi çetinî bê lidarxistin.

Nivîskarên ku bi Kurmancî van salên dawî de efrandinên xwe derdixin, ji aliyê hêz û naveroka nivîsandinên xwe bi ser sê celebên tînan cudakirin: Celebek hîn pala xwe dide ser kendal û kaniyên zargotina Kurmancî û ji zêdetir naçe; Çelebek jî berê xwe dide çaviya êş û xemên jiyandî û celeba dawî jî hewldide hûnerên jiyana Kurdî bi hewesek vergerandinê (tercume) derxe, bê ku dêmê Kurdayetiyê bi zelalî bide xuyakirin.

Gava em bidin ser şopa Bavê Nazê ya ku li ser dêmê wêjeya Kurdî hiştiye, ji dema çîroka wî ya yekemîn "Navê min Xoşnave" sala 1974 ta roja îro, emê raserî dewsa destê hostakî çalak bînin. Çîroka "Navê min Xoşnave" ta neha zêdeyî şeş çaran di kovar û rojnamên Erebbî, Kurdî û Sovyetî de hatiye weşandin. Ev yekê han tenê rastiyeke din eşkere kir: Çîrokê vîza xwe ji xwendevana stend, jiyana xwe di nav gel de dît. Piştî çar salan, Bavê Nazê Romana xwe "Çiyayên bi xwînê avdayî" derxist. Ev roman bû ciyê şanaziyek mezin ji me re, ne tenê ji ber ku romana kurmancî ya yekemîn bû (ji der efrandinên kurdên Sovyet) lê belê ji ber asêlêkirina wê ya tekûz. u her wiha ji ber "giringiya wê di hişiyarbûna Kurdan de"(4); ji ber kû

"dike Kurd çalakî tekoşîna çîneyetî û rêzanî ji bo bidestxistina mafê mirovayetî bike"(5)

Weşandina vê romanê bi zimanê rûsî sala 1982'ya di

10

gel roman û çîrokên nivîskarên kontînênta Asiya yê bi nav û deng, jiyaneke nû da romanê.

Di van çîrokên teze de, Bavê nazê carek din bi rewak dewlemend û hêzek têr qinyat xwe şanî xwendevana dide.

Bi derketina van kurteçîrokan ne tenê şikarta Bavê

Nazê di gulîstana çand û wêja Kurdî de geş dibe, rengê wê xweş difoe, lê her wiha pê surrek bayê hênik li pel û şaxên temamiya gulîstanê dixê, ber û fêkiyên çande pêre pêre jî dighên.

Ridwan Elî

1) Bi zarava soranî yekemîn çîroka toremendî di sala 1925'an de hatiye weşandin, ew jî ya Cemîl Saîb bû foi navê "Eway li xaw bînim"5<Min ew di xewnde dît".

Biner: Marûf Xeznedar: "Kurte-dîroka wêjeya kurdiyî teze" Mosko. 1967 (bi zimanê rûsî) r. 142

2)Pirtûka ereb Şemo ya yekemîn di warê proza toremendî de di sala 1930'î de derket, ew jî pirtûka "Şivanê Kurd" bû.

3) Binêr li kovara "Çiya" jimarên 1-8, çapa teze bi tunê pirtûkê. Ewropa 1974. Civandina Hemreşê Reşo.

4)Pêşgotina M.S. Lazarev ji pirtûka "Çiyayên bi xwînê avdayî", çapa rûsî

5)Li wir jî

11

Bi adetî, yê ho hindik dizanin  
geUkî dipeyivin ûyên ko gelek dizanin  
hindik dipeyivin. (Ruso)

Heke mirov ev herdu tişt danîne  
ber hev, dibîne ko tiştê ko pê dizane,  
ligora tiştên ko pê nizane, gelek hindik  
e. (Fontnêl)

### NAVÊ MÎN XOŞNAVE

Nayê bîra min kengî min xwe naskir, lê xweş tê bîra min  
xew nediket çavên min, heya diya min çîrokekji min re negota.  
. . Bi riya çîrokan ez hogîrî odê bûm. Ev oda ku bi şev kesên  
mezin bi guhdarî kirina stiran û çîrokan şevbêrkên xwe tede  
dibuhurandin.

Lê mixabin rûniştinali wirji me zarokan re qedexê bû. Dîsa  
jî her û her me hewlê dida da derbas bin hundirê odê. U  
her car xulamê axê bi guhên me digirt, em diqewirandin. Lê  
ku dihat û Xwedê li hev tanî, bi fen û fûtan em derbasî hundir  
dibûn. Ciyên me ji şûna şekalan bûn. Lê dema em diman ji  
12

derveyî odê (ew jî gelekî pir bûn) em radipelikîn penceran,  
da ku em çîrok û çivanokan bibihîzin. Lê camê nedihîşt deng  
bê me. Lomajî rûhê me, qasî ku ji xulamê axê diçû, hewqas  
jîji camê diçû.

Di vir de, divê ez rastiyê bêjim; heger em deynin ber carên  
heval û hogirên xwe, ez gelekî kê mî caran li ber pencerê dimam.  
Ji ber ku bavê min qedrê wî li gund hebû yek carna ji  
min re dihiştin ku ez şevbêrkê li nav mezinan bikim. Tevî ku  
di odê de ez di nav şekalan de û nêzîkî ciyê xulam rûdiniştim

jî her û her ez kêfxweş bûm. Li gor vê bextiyarîya min çî qasî heval û hogirên mi ji mi diqehirîn. U çavên wan bar ne dibûn!.. Lê min ev tişt di ber guhên xwe re ber dida û xwe di cîhana çîrok û destana de ji bîr dikir.

Heger mezin bi ode bûn, em zarok ne kêmî wan bûn. Oda me garsîna nava gund û teyar û zolikên dora wê bûn. Heger çîrokvanê mezinan nêzîkî axê rûdinişt, lê ez çîrokvanê zarokan di nav wan de, min di cîyê xweş û baş, bi şahnazî û payetî rûdiniştim. Lewra min xwe bi zanebûna çîrokan di ser hevalên xwe re digirt. Di nav wan de hawayê dengbêjên mezinan dikir, xwe bi vî alî û wî alî de dihejand, dikuxuyam da ku deng zelal bibe û min çîrokên ku di odê de bihistibûn ji wan re digot. Carna jî min hin çîrok ji cem xwe çêdikirin. Bi hawakî ku min hinek ji vê çîrokê, hinek ji ya din digirt û bi hev perçîm dikir. Lê hevalên şareza "dizîtî"ya min nasdikirin û digotin: "Te ev ji wê çîrokê û ev jîji ya han biriye." Bi kurtî, qulopaziya min nediçû serî.

U rojekê ji rîjan, dawîya havînê tişteki ku hîç ne li ser bala min bû bi min re bihurî. Bavê min ji mi re got;

-Divê ti herî bajêr, ji bû ku ti têkevî mektebê.

Min navê bajêr bihistî bû, çimkî mala birê min ê mezin li wir bû. U bêtî ku ez zanibim çima, lê tim û tim navê bajêr li cem min bi navê nanê firnê, şeker û helawê hati bû girêdan.

13

Lê bêxwediya mektebê çiyê?

Tu di bê qey bavê min di dilê min de bû, dema peyîvî:

-Kurê min mekteb mîna odê ye, lê tenê ji bo zaroka ye. Di vir de ji çîrokê odan xweştir dibêjin.

Ji kêfa, min xwe negirt bi bazdan ez derketim nav gund û  
min ban kir:

-Ezê herim bajêr. . . Ezê herim mektebê û di nava xwe de mi  
digot "Lê bêtirs ezê çîroka bibihîzim."

Di demek kurt de hevalan hemuyan xebera çûna min a bajêr  
bihîstin. Wan jî doza çûna mektebê ji dê û bavên xwe kirin.  
Lê doza wan bi cî nehat, Lewra ji zû de qedera wan bi şivantiyê  
û gavantiyê ve hatibû girêdan. Bi qiriktalî giriyan.

Ma gelo çi çek di destên zarokan de heye ji xeynê rondikan!

Demek dirêj neçû, min berê xwe da bajêr û cara yekem ji  
xuşka xwe ya biçûk û diya xwe bi dûr ketim. U min devji heval  
û hogirên xwe yên ku bi xemgînî min bi rê kirin, berda.

Di bajêr de hemû tişt li ber çavên min binuhîti xuya dikir.

Trimbêl, avayî û heya kesên vir ne mîna yên gund bûn. Da ku  
ez xwe biyanî di nav zarokên vir de nebînim, min ew didan  
ber hevalên gund, min digot: "Ev mîna Felemez e, evê han  
wek Husnîko ye û ev bira jî mîna Cenbelîko ye. U ev...?" Zarok  
wiha li bajêr pir bûn, mîna gêrikan. Ezji hejmar diketim  
û li ber çavên min zarokên nenas di şûna dostên min de radiwestiyan.

Di vir de hîn bêtir dilê min bi ser gund û malê ve  
bû û min bêriya wan dikir.

Dawiya dawî ew roj hat, ku birê min ê mezin ez birim dibistanê.

Erê! Dibistana ku ji bo wê ez li virim. Di sikakên bajêr  
de me gelek fitil û çiv dan xwe heya em gihîştin avayiyek  
mezih mîna oda axê. Birê min destê xwe bi alî wê ve kir û got:

-Ev mekteb e.

Hîn em negihîştin, ku derbasî hundirê wê bin, şagirtên dibistanê  
mîna kulmozê di me derbûn. Erê ez jî wek wan bi

14

berdilka reş bûm. Lê min xwe didît qijakek sipî di nav qijakan de.

Birayê min derbasî ba mudîr bû û piştî demek ne dirêj li min vegeriya û got:

-Min navê te nivîsand. U di vê seffê de tê bixwînî -Birê min destê xwe bi alî odakê ve kir- û tê bi van zarokan re bî. Di vir de wî destê xwe bi alî komikek zarok kir û bê deng ez hiştim û derket.

Bi rastî heger ez ne çiyayî bû ma ûji gotinên xelkê netirsiya ma minê bida pey birê xwe.

... . A Lê min bi çiyayîtiya xwe girt, ez mam li ciyê xwe bêdeng. U lêxistina zengil riya vegeerê li ber min birî. Bi dengdana zengil deng ji şagirtan biliya û bêpêjniyê perdên xwe avêtin ser hewşê.

Bi dengdana zengilê duduyan hemûyan bi bazdan berê xwe dan devê deriyê seffên xwe û bi rêz rawestiyayî man. Ez jî ketim nav refê xwe. Piştî yeko-yeko em derbasî hundir bûn. Li hundir cara yekem min kursî û masên dibistanê dît.

Di dilê xwe de min got: "U ev jî di oda de tune!"

Di seffê de li cîkî vala rûniştim, bê ku ez ji kesî bipirsim. Ji nişka ve merovek bi kincên efendîtî derbasî hundir bû. Gurîna bi şagirtan ket, ji ber rabûn. Bi gurîna wan ez veciniqîm, lê min xwe girt û ez jî mîna wan bi temene sekinîm. Piştî ku vî merovî çend gotinên xwe peyîvî, şagirt rûniştin, ez jî bi wan re... Dûre deng ji seffê biliya. Merovê efendî bi awirên xwe di nav me de geriya, heya li ser min sekinî. Li min nêrî û peyîvî. Hemûya berê xwe bi alî min de vekirin. Min cî ji xwe re nedidît, dilê min dihat guvaştin bê ku zanibim ezê çî



bikim. Di vê demê de kurikê teniştî min hilmisek li min da  
û bi zimanê me got:

-Çima tu bersîva mamoste nadî?

Bi dengê bilind min lê vegerand:

-Ma efendî çî ji min dixwaze?

15

Şagirtê li teniştî min û pêre yê din jî bi hêl kenyan. (Diyar  
bû li ser gotina efendî dikenyan). Efendî awir di wan veda  
û hemû man bêdeng. Pişt re şagirtê li teniştî min bû tercuman  
di nav min û efendî de. Hat diyarkirin ku mamoste  
(dûre piştî demekê min naskir ku ji wan kesan re dibêjin mamoste)  
pirsa nav û temenê min û hin pirsên din dikir.

Min li dibistanê çend saet qedand, ku ji min re bûbûn wek  
salan. Hîn bêtir min bêriya gund, dê û heval û hogirên xwe  
kir. U hîn bêtir rûhê min ji bajêr û xelkên wê çû. Ez bi dilşikestî  
vegeriyam malê û min naskir ku bavê min cara yekem  
ez xapandim. Ez ku gihîştim negihîştim malê, min berê xwe  
da bavê xwe ( hîn ew li bajêr bû) û min jê pirsî:

-Kanî stranvan û çîrokvanên te? U çima ne bi zimanên me  
dipeyivin?

Bavê min dît ku bi van gotinên han min nigên xwe zêdeyî  
xwe avêtin, lê tevî wilo ew ji iyarê xwe derneket, bi rûyê min  
de ne pijiqî. Berovajî, bi dengê dilovanî, ne wek ê hercarî yê  
di van hala de bi min re peyivî:

-Kurê min hîn ti biçûk î... Demek dirêj wê nere tê hemû  
tiştî nasbikî. U çîrokajî wêji we re bêjin. Lê li ser ziman; divê  
ti nasbikî ku zimanê me yê malê ye, û ew zimanê din ê mektebê  
ye -bavê min destê xwe danî ser milê min û berdewam kirkurê

min bahweriya mi bi te tê. Maşellah ti bi hiş î û di demek ne dirêj de tê wek bilbil bi zimanê hukûmetê bipeyvî. Min ji bavê xwe ne pirsî, çima zimanê me yê malê ye û çima yê din yê mektebê ye. Lewra di mala me de gotinên mezinan nedibûn didu û her û her wê bi ya wan bûna.

Roj û meh buhurîn lê her û her dibistan nebû mîna odê ji xeynî dersa însa (1). Çimkî ew dersa han ji dûranî çîrok û çîvanok tanî bîra min. U bi rastî jî vê dersê ji yê din bêtir ez dêşandim. Ne tenê wilo, heya ruhê min ji dibistanê dibir. Di vê dersê de her şagirtekî diva bû li ser serpihatiyek xwe

16

bipeyiviya yanjî çîrokekji çîrokên ku bihîstibû bigota. Dema dor digihîşt min, min dixwest çîroka li ber dilê min şîrîntir kîjane wê bêjim, lê min nikarîbû; lewra devê min diket hev û sermiyanê min ji gotinên zimanê nuh hindik bûn nikarîbû alîkariya min bike ji bo kû ya dilê xwe bêjim. Di şûna ku mamoste alîkariyê bi min re bike, digot:

-E li dû wî.

Ax, xwezî wî zanîbûya ez çiqasî bi vê peyvê diêşiyam!! Û erê gelek sal bihurîn di jiyana min de lê her û her ew gotina han man kulên giran di dilê min de. U çiqasî ji bo vê gotinê di xew de qarîn bi min diket, diya min ez ji xew radikirim û digot:

-Kurê min te xêr e, çima ti di xewê de dikî qerebalix! ! Hebe tine be kabûs li ser dilê te rûniştibû, çima te dikir qarîn? Helbet min a rastî ji diya xwe re ne digot û a rast ew bû, diya min ez ji xew radikirim, gava mamosta digot "E li dû wî."  
Carna jî diya min ez ji xew radikirim û dipirsî:

-Te xêr bû kurê mi, ti di xewa xwe de dikeniyayî?

Diyar bû ku dema mamosta bi zimanê me dipeyvî û dipirsî ez dikeniyam.

-Kî wê çîrokekê ji me re bêje?

Min tiliya xwe bilind fikir û digot:

-Ezê... Ezê...

Mamoste rê dida min û ez bi şarezayî dipeyvîm. Piştî temambûna çîrokê mamoste digot: "Bravo!" berê xwe dida şagirtan "Jê re li çepika xin!"

Belê, roj û meh çûn, dû re salan jî dan dû wan... Gelek tişt di jiyana min de hatin guhartin, tenê xwezîtiya nivîskariyê bi min re ma.

Erê, sal çûn û ez jî bûm mamostê seffa yekem li gundekî.

Ev dursa yekem e. Şagirt ji ber min rabûn û bi temene man rawestiyayî.

17

Mina hemû mamostayên cîhanê min xwe bi wan da naskirin, yeko yeko, navên wan jî pirsî û di defterê da nivîsand. Dema dor gihîşt yekî ji wan, ew ma bêdeng û bersiva pirsê min a li ser navê wî neda. Min lê nêrî û pirsê xwe ducar kir.

-Navê te?

Ma bêdeng û serê xwe xist ber xwe, ez bi ber wî de çûm.

Lewra baweriya min hat ku ji min fam nake. Ji bo wilo min bi zimanê Kurdî -bibuhurin bi zimanê malê- jê pirsî:

-Navê te çiye?

Şagirt serê xwe rakir. Çavên wî mişt hêsir bûn, bi dev li ken û lêv ricifî got:

-Na...vê mi... Xoşnave...

Tevizînok bi laşê min ketin û mi xwe dît di Xoşnav de... Ma gelo ewê xwe di hinekên din de bibîne?!

18

WE KENGI BE

Xwe avêt nigên wê, borînî pêket û got:

-Yadê! Wa yadê bi qurbanê, tê mi efû bike. Çimkî mi gelek serêşi ji te re çêkir û mi dilê te hişt û êşand.

Dê runişt, ku wî rake ji ber nigên xwe. Ew hembêz kir û bi dilovanî maçî kir. Di nav girî de û di ber xwe de jê re got:

-Lawê mi dawî va ti hatî û me hev dît. Mi digot qey nema em hev dibînin...

Pişt re Siyamendji xew rabû û kir nekir nema çavên wî çûn ser hev. Lewra dûrbûna ji welat û ew xewna, ku nuha dît kul û derdên wî rakirin. Berî hemû tiştî ew bîstka ku xatir ji dê û

19

bavê xwe xwest. Wê çaxê dê jê pirsî:

-Rastî tê herî û heya şeş salan, em nema hev dibînin?

Berê Siyamend li ser çûna Ewropa yaji bo xwendinê bi diya xwe re peyivîbû. Tevî ku dilê wê dixist cî û jê re digot, hersal emê hevdû bibînin. Lê her û her gotina "erê" nedixist destê wê. Dema roja çûnê hat, jê re got ezê herim ba hevlekî xwe. Siyamend ev derewa han kir, lewra diya wî gelekî nexweş bû. Daku nexweşî girantir nebe, gotina rast, ya tal jê re negot. Ji wê rojê de dûrî hev ketin û ta rqa îro hîn negihiştine hev.

Dema Siyamend xatir ji bavê xwe xwest, bav jê re got:

-Kurê min, ez xweş zanim ku em nema hev dibînin.

Siyamend di ber dilê bavê xwe da û devliken ji re got:

-Bereka Xwedê li te be yabo. Mal avao, tê hîna sed salî bikî  
û tê ji dîtina min aciz bibî.

Bav bişirî, weke kesê ku bêje "Ez ne zarokim û ez zanim çi  
dibêjim..."

\* \* \*

Piştî sê salan ji çûna xwe, Siyamend peyvên han di namakê  
deji dostekî xwend: "Bera tû saxbî, zilambî... Bavê te çû rehmetê  
di roja..."

Wê çaxê tîp û ûşeyên namê bi rewrewekî li ber çavên wî  
çûn û hatin.

Siyamend mîna dîna di sikakên bajêr ên mişt xelk, geh dimeşiya  
geh bazdida û geh jî di sikakên teng û vala de derbasdibû.

Bi vî awayî xwe dît-nedît ku li ber unîversîtê ye. Wê çaxê,  
berê xwe da fakultiya xwe û bi hêrs pê re peyivî:

-Ji bo te min dev ji meriv û welatê xwe berda û bavê min  
jî mir, min ew nedît. Bela lanet bê li wê seeta ku min biryar  
stend bi berdewama xwendinê!

Bê ku li ser dîna wî be, dengê ji dûrve hat:

-Ma gelo te nebihîstiyê ev meteloka han: "Doza xwendinê  
20

bike heger li Çîn ê be!"

Siyamend li dengê ku li ber guhê wî ket vegerand:

-Doza xwendinê ji kê re? ji bo çi?

Ji nûv re deng lê vegerand:

-Sed mixabui, hîn tu nizanî te çima ev qonax qetandine.

Siyamend guhên xwe miç kir û bi dengê hîn bilindtir vegerand:

-Loma tu nizanî di vê riyê de tiştê ku ez distînim naghê nîvê  
ku ez winda dikim?

Deng jî serttir lê vegerand:

-Tu çi bê mejiyî. Tevî ku te xwendina xwe di nav herdu dîwarên min de xwendiyê. Kêji te re gotiyê jiyana bi rehetî dikeve destê meriv! Ma gelo tu nizanî rîya wê bi stirî û tirsê? Di be ku tu qels bûyî û nema di xwe re dibînî di rîya xwe de berdewam bikî.

Siyamend bi wan gotinan êşiya û li ber xwe ket, lê her û her bi tona berê lê vegerand:

-Çima gelo ezê xwe bidim kuştin û xeynî min di jiyana de bigîhên doza xwe bi rehetî û xweşî. Lewra ez jî...

Deng gotin ji devê wî girt:

-Anha.. erê anha min naskir tu çi dixwazî. Tu li navê xwe digerî. Lê tuji bîr dikî, ku tu ne weke wan kesên ku armancên xwe dîrî bêvilên xwe nabînin, çimkî milletekî bindest û stuxwar li benda te ye. Ma tu nizanî ku tu ji bo wan hatiyî, qey te ji bîr kiriye?!

-Tê bîra min û min ji bîr nekiriye, lê ez westiyam. Erê ez westiyam û dixwazim weke kesên din bijîm. Mîna keroşk û mişkan. Tenê ku ez bimînim li dinê.

Deng lê vegerand:

-Gelo nayê bîra te gotina yekî ji hozanan: "Jiyana şêrîne lê jê xweştir û xweşiktir xebata ji bo wê ye."

Bi hêrs Siyamend lê vegerand:

21

-Bese, min têr gotin xwar, ka bavê min. Ez diya xwe dixwazim, ez bavê xwe dixwazim. Ez dixwazim bi rehetî bijîm û ne zêdetir...

Bê pêjniyê konê xwe berda erdê. Siyamend guhê xwe miç

kir ku ji nû ve deng bibîhîze, lê bê fêde bû.

Nayê bîra Siyamend kengî gihaşt malê. Lê tê bîrê ku li ber unîversîtê li ser kaboka runiştî bû û banê dikir:

-Bibhur, min efû bike, min xwe winda kiribû û hişê xwe berdabû.

Her û her Siyamend nizane ku diya wî li ser ruyê dinyê ye yan na, lê zanî bû ku dema yek ji cem tê, diya wî diçe ba wî jê dipirse: "Çima ew jî nayê, kurê min, dilovanê min, ez li bendî me."

Siyamend pir ditirse ku nema wê bibîne, mîna ku bavê xwe nedît berî mirinê. Di nava xwe de diqijqije û dişewite li ser vê dûrbûna wan aji hev. Welat û dê wîna dikişkişînin bi alî xwe de, lê sedemek heye ku Siyamend nikare li wan vegere.

22

#### XANIYE VALA

Erê Taxa Herbiya taxekji taxên bajêr bû, lê bi rastî gundek di nav de bû. Ne wiha navê gund li taxê bibû. Lewra kesên tê de dijîn hemû dan û stendinên gundayetî bi xwe re anîbûn.

Em zarok, heger li gund êvaran li ser benderan me dilîst, li vir, li bajêr, li başûrê malan, li dora bexçan, herwekî mîna li gund me dilîst. Dema havînî, dijwarî ne diketin ber me.

Me heya nîvê şevê li ber tava heyvê.şevbêrkên xwe bi lîskên; "Çirê", "Yadê Xezalê" û yan jî bi dizîtiya ji bexçe û werzan derbas dikirin. Dema cîba axê gundê biniya bajêr ji meyxane û çayxanan vedigeriya, emjî dihatin malên xwe. Çima di vê

23

demê de em vedigeriyan? Ne dûre me bi riya wî nasdikir, ku şev ketiye nîvê xwe yê duduya û diva bû em razên. U ne dût

bû ku em li bendî axê diman ku em heciyatên nivtazî li teniştaya wî bibîn. Dibe ku herdu sedem bi hev re em dihiştin heya derengîya şevê. Piştî ku em di toza cîba axê diman şevbêrka me bela wela dibû.

Dawiya payîzê, zivistanê û pêşya buharê em diman bê war. Çimkî malek ji yên me tune bû, ku me bihewîne, bi vî awayî em li ber qorzişkên malan diman, da em çîrokari ji hev re bêjin û şevbêrkên xwe bikin. Lê baran û sermê ne dihişt em tamedê ji çîrokên xwe bikin. Heger ne Heciyê Qurdîsî bûya, emê mabûna li ber dîwaran.

Piştî ku Hecî bexçê xwe berda û cenanê wî barkir, xanyê cenantiyê ma vala. Kurê Hecî yê biçûk; ewjî hevalê me bû û bi me re dilîst. Ji bo vê yekê dilê wî bi me şewitî û kilîta xanî da me. Xwezî we zanîbûna çiqasî em şabûn bi vî xanî! Bi girtin û vekirina çavan hundur hate xemilandin. Her yekî ji me tiştê ji malê anî, yan jî dizî. En ku merş anîn, ên ku belgeh anîn... Bi kurtî hundirê me bû wek malên bi xwedî û bi xêr û bêr.

Zivistana me bi xweşî derbas bû. Pişt re mîna her car buhar, dû re havîn bi serme de hat. Dîsa bi şev li ber tava heyvê me lîstikên zarotî dilistîn. Bi roj jî di qice-qica rîjê de em di xaniyê xwe de rudiniştin. Lê kêfê xweşiya me berdewam nekir. Lewra rojekê ji rojan em hatin "mala xwe" me dît pîrekêke bi du zarokên xwe lê daniye. Pişt re me naskir, ku Heciyê Qurdîsî xanî jê re vekiriye û dayê.

Ew mal ji ku û çima hatiye, kesî ji me nizanî bû. Tenê me bihîst ku mîrê pîrekê hatiye kuştin. Lê çima û ji bo çi? Dîsa me nizanî bû.



Di destpêkê de bi her awayî me dijminantiya vê malê kir.  
Geh me li kurê mezin ê di temenê me de bû dixist, geh me ke-  
24

vir davêtin hundur bêyî ku em zanibin wê li çî û kê keve. Lê  
rojekê, girîyê dê û kurê biçûk ê bi navê Lawiko em ji hovîtiyê  
derxistin. Lewra kurik ji birçî bûna û dê jî ji bêçariyê digiryan.

Me ev yek ji gotinê dê ku ji kurê mezin re digot, naskir:

-Here parsê, belkî ti nanekî ji me re bidî hev. Ma tu nabînî  
wê birê te ji birçîna bimre. Ma ne qaşo tu mezinê malê yî.  
Berces mezinê malê heşt-neh salî bû. Bi gotinên diya xwe  
serê xwe bera ber xwe da û bêdeng ma.

Me hemiya li hev nêrî bê ku em bipeyivin, me berê xwe da  
malên xwe. Piştî demek ne dirêj her kesî tiştek ji wan re anî.  
Berces ji fediya hîn bêtir serê xwe xûzkir. Dê çav bi hêsir  
xwarin girt. U ji me re dua kir. Kurkê biçûk giriyê xwe birî  
û bi gepa hate nan û xurman. Uji wê rîjê de me nema li Berces  
xist. Em bûn dostên vê mala biçûk, hejar û bêkes.

Dê di nav malan de kar dikir û Berces li ber birê xwe yê biçûk  
dima. Ne tenê ew, lê me jî alîkarî pê re dikir. Dûre, me  
naskir ku gelek caran, ji tirsê me re dê nikari bû zarokên xwe  
li malê bihişt û malên ku kar tê de dikir ne dihiştin bi zarokên  
xwe bihata. Bi hogiriya me ji vê malê re, ew û em ketin  
jiyanek nû. Bi rîjê di kela germê de, me xwe davêt hundirê xanî  
wek berê. Evarajî me li dora wî dilîst. Bi vî awayî havîn kete  
dawiya xwe. Heya vê demê dê û zarokên wê, hinekî bi ser  
xwe ve hatin. Hem ji karê dê, hem ji alîkariya me, û hem ji  
zekat û fitran.

Rojekê beyanî mîna her car her yekîji me tiştekji xwarinê

di dest de em hatin xanî. Li devê derî Berces em vegerandin:

-Birê min bi sorika ketiye, diya min dibêje, heger kesên bi sorika ne ketine, bira derbas nebin.

Erê di van çend rojên dawî de, me didît ku Lawiko sisto fisto ye, lê hîç me bîra nexweşiyê nedibir. Gelekan ji me, ji gotinên dê û bavên xwe zanî bû ku bi sorikan ketine lê hin kesên me jî nizanîbûn. Lê tevî wiha, kes ji me venegeriya.

25

Di hundir de, di quncikekê de Lawiko di nav ciya de bû; Dê heya qirkê ew nexumandibû, tevî ku dem havîn bû jî. Demek dirêj em li ser rawestiyan bê ku dê û em bi hevra bipeyivin. Lawiko jî xar bû. Ji nişkave bû pist-pist di nav me de û em derketin.

Çaxê êvarî em hatin û herkesî ji me tamtîtek ji bo Lawiko bi xwe re anî bû. Vê carê dê ciyê kurkê xwe yê biçûk derxisti bû ji derve, ser erzêlê. Dema me diyariyên xwe da destê dê, wê jî ban Lawiko kir, destê xwe li ser porê wî bir û anî û jê re got:

-Binêr lawo, hevalên te çi ji te re anîne!

Bi sistayî Lawiko çavên xwe vekir û awirên xwe li tamtîtkên ku me jê re kirîbûn gerand. Lê em man mat mayî dema me kêf xweşî di çavên wî de ne xwendin. Lawiko çavên xwe girtin û dîsa xar bû.

Em man behetî, çimkî bi bûzakê, yan bi teyîbûneyê berê rqjê deh caran me ew dişand avê û nan. Lê niha ev tiştên han, li ber destê wî bûn ne doz dikir ne destê xwe davêtiyê.

Dê li ber serî, her bistikekê paçik di zerka avê de şil dikir û datanî ser eniyê. Deng ji dê biliya bû, geh keser vedida, geh

hêsir bêdeng dibarand û geh jî xwe davêt ocaxên ewliyan.  
Wê êvarê me listîkên xwe nekirin. U em man li ber destê  
dê. Dema şev zîz bû, bi tenê reyandina segan, didan nasîn  
hatin û çûna rêwiyan. Lawiko yek car bê hal bû. Yekîji me bi  
dizîka ji kurê melê re got:

-Here dû bavê xwe, ji bo ku bê yasîne li ser bixwîne.

-Ne hewce ye, zarok teyrikê bihiştêne. -Kurê mele bi zanatî  
bersî da- U em dîsa man bêdeng. Lê bêdengiya me berdewam  
nekir. Lewra qêrînek bi dê ket. Bi qêrîna wê me naskir,  
ku lawiko ruh da. Dê ne tenê digiriya, dilê wêji nava wê derdiket.  
Por bi xwe nehişt. Berces xwe bi girî di erdê dida, û em  
jî pêre. Di vê demê de cîba axê derbas bû, em di nav tirabêlkê  
26

de man. Lê kes ji me ranebû û venegerya malê.

Piştî çend rojan ev mala ku bi du kesan ma ji nişkave çilo  
hatibû, wihajî winda bû. Me zarokan xweş zanî bû ku ev mal  
nema vedigere, tevî wiha jî em hîç nema hatin "Xaniyê  
Vala"

27

## RÛREŞ

Hemo, qutiyek tûtînê, çeqmaqê bi fitîl û kurkek nuh da  
destê kurê xwe Beko yê çarde salî û jê re got:

-Tu zanî ji bo çi min ev tiştên han ji te re kirîn?

Devê Beko ma ji hev, bê ku bawer bike ji çav û guhên xwe û  
di dilê xwe de got: "Heye tune ye wê tiştêk bi bavê min hatibe.

U dibe ku di navbêna min û birê min de şaşbûye. Ma gelo ne  
wî berî çend rojekî hezar gotin ji min re kir, dema çixare di  
destê min de dît. Ne tenê wilo, bi ser de min li malê çend şirmaq

jî xwarin. Na, na tiştêk pê hatiye?"

Hemo rê li ber mujûlbûna kurê xwe birî dema jê pirsî:

28

-Rastî, ti nizanî ji bo çî min ev tişt kirîn?

-Na, yabo, ma ezê ji ku zanibim. -Beko bersîv da û hîn jî bi çavekî ne bawerî li bavê xwe temaşe kir.

Bav ne xwest lîstika pisîk û mişka bi law re bidomîne, jê re got:

-Kurê min Beko, ti bûyî zilam û ev xelatên han ji bona xwestina qîza Hecî Elî ji te re.

Ev xebera han ne kêmi xelatan, Beko bê hêş û gêj kir. Ji bo weha bêhemdî peyv vegerand:

-Xwestina qîza Hecî Elî ji min re?

-Erê kurê min, zilamê heqîqî ewe, yê ku di imrê te de jina tîne.

Şeva daweta Sîno, dilê Beko cara yekem bi hawakî din lêxist û dixwest ku bavê wîjî yekê mîna ya hevalê wîjê ra baniya.

Lê tevî vî tiştî şermê rê ne dida ber. Lê ne tenê şermê, Beko digot: "Kesên jinan ji bavên xwe dixwazin bê fedî ne." U wî jîji xwe re digot: "Heger ez bimrim jî tu carî ji bavê xwe jina naxwazim!" Lê niha dema bavê wî li ser xwestinê jê re peyîvî ku wê di demek nêzîk bibe bi jin, dilê wî bi tirs û kêf lêxist, bê hemdî xwe bişirî.

Hemo ev tişt dît û bi hêrs jê pirsî:

-Ma ti pirsî navê dergistiya xwe nakî?

Di vir de dîsa xewn û rastî di dilê Beko de tevî hevbûn û xwe dît gunehkar bê ku gunehên wî hebin, ji bo wiha bi fedî û giranî bersiva bavê da:

-Ez nizanim.

-Kurê min navê wê Sultanê ye, û ewjî li gora navê xwe ye

-bav wiha got, destê xwe bi dilovanî li milê Beko xist û gotina xwe berdewam kir:- Lê divê ji niha û pêve ti xwe ji bîr nekî, ku ti bi dergistiyî û ji bo wihajî divê ti nema bi heval û hogirên barote re bigerî. Çimkî wê ne laîq bê lîsk bi wan re.

Di virde bav dej kur berda û Beko di ciyê xwe de ma heyirî.

29

Zû bi zû xwestina keçekê ji Beko re, di nav hevalên wî de bela bû. Wanjî berê xwe danê, dakû wî pîroz bikin, ji alîkî, û ji alîkî din qala xwestin û guhestina keçikan bikin. Lê Beko, gotinên bav bi cî anî, guh neda wan û bi wan re derneket derveyî gund.

Destpêkê heval û hogirên wî nasnekirin sedemê xwe danaliya Beko ji wan, lê têgiştin, gava diya wî bera wan da û got:

-Hûn ne yên ku Beko bi we re bilîze. ! Beko bûye zava û mezin bûye.

Bi rastî jî Beko bi qudreta Xwedê bû ji mezinan û wanjî di nav civatên xwe de ew hewandin. Ji bo wilo dilê hevalên wî tije qehir dibûn û bi çavnebarî lê dinêrîn. Lê Beko xwe paye fikir ne tenê bi rûniştina bi mezinan re û bi çeqmaq û qutiya xwe jî. Ji bo wiha Beko bi minasebet û bê minasebet qutiya xwe dida yên dora xwe û ji xwe re jî çixarek dipêça.

Beko mehekê bi şanzî derbas kir. Lê pişt re acizî kete canê wî. U ev lîska nuh a bi mezina re li cem bû bêmane. Di ser re \* jî, Beko dît ku xelkê mesela dergîstiya wîji bîrkiriye û kes nema qala wî dike. Di dilê Beko da hat vejandin zarokîtiya wî û dîsa wek berê kete nav rêzên wan.

Bav dîna xwe da kurê xwe û dît çî pêre çêdibe. Ji bo wilo rojekê ji rojan ban wî kir û jê re got:

-Beko kurê min diva bû, ti ji zûda çûba mala dergista xwe, lê ne xem e niha jî ti karî herî.

Beko bi gotina çûnê veciniqî û ma heyîrî çî bêje. Bê hemdî peyva zaroktî ji devê wî derket:

-Bi tena xwe?

-Maşellah! Ma tu biçûkî! Helbet bi tena xwe.

Heya vir gotin hat birîn. Beko xweş naskir ku peyv li ser neçûnê bi bav re bê fêde ye, ji bo wiha (tevî ku dinya payîz bû, da ku xwe pê mezin bike) kurkê xwe li xwe kir, destê xwe di ser berîkên xwe re bir, ji bo ku nasbike ku qutî û çeqmaq di 30

ciyên xwe dene.

Beko dûre yek nekir didû xwe avêt ser hespê û berê xwe da xezure xwe.

Mala dergistiyê bi kefxweşî pêrgî wî hatin. Beko bi xezûrê xwe re li oda mêvanan rûnişt. Çavên wî çarçav dibûn û bi awirên xwe li dergistiyê digeriya. U dema "apê" wî jê pirsî:

-Te xêre kurê min?

Bi zaroktî lê vegerand û gotina bavê xwe got:

-Ez hatime dergistiya xwe bibînim.

Hecî Elî li ser vê gotinê di ber xwe de bişirî û hemdê xwe kir, ku ew bi tena xwe ne. Hecî Elî naskir ku ya baş ewe, ku bi mehnakê qîzê bîne aliyê zilaman, hîn ku kes ne hatiye bawan. Hecî Elî rabû ser xwe û berê xwe da aliyê malê. Devê Bekoji kêfa maji hev, dema dengê "xezûrê" wî hatiyê: "Sultanê, keça min şebeş bibe hundir û ji mêvanê me re bişkîne."

Hecî Elî vegeriya û pêre qîza wî. Da ku Beko zilamîtiya xwe pêş dergistiyê bike qutî û çeqmaq ji berîka xwe derxist, hem ji kêfa hemjî ji fediya, bi destekî recifî dest bi pêçana çixarekê kir. U hîn bêtir herbilî û lebikî gava çavên wan bi hev ketin. Rûçikên Sultanê bi awirên wî re bi sorgulî reng da, mijankên xwe yên dirêj berda ser çavên mezin û reşbelek. Beko pêçandina xwe berdewamkir û Sultanê dest bi telaşkirina şebeş kir. Sultanê şebeş tifil-tifil dikir û dixwest xwe jê re şareza bide xuyakirin. Beko jî dixwest bi qalûnvexwirî bi zilamtîjê re bide nasîn. Sultanê da xwe ku mesefê deyne ber. Beko jî destê xwe li çerxa çeqmaq xist da ku fitîl pêkeve. Lê çirûskji kevirê çeqmaq neçû. Beko du carî-sêcarî kir lê her û her bê fêde bû. Ji fediya û qehra reşxeniqî dev li lêva xwe yajêr kir û ta Xwedê hêz dayê dawiya kefa xwe li çerxê xist. Di virde ji bê bextiya re Beko ba ji ber çû.

Sultanê xwe negirt, mesef avêt bi ken û bazdan berê xwe da aliyê malê. Hecî Elî di xwe de dernexist mîna ku tiştê ne-  
31

bihîstiye. Beko bîstekê ma hişk li ciyê xwe û dû re wek golika ku mozqirtik bi pey keve bi bazdan ji hundir derket. Beko bazdida, ti di bê qey bi rastî mozan daye dû. Ew sekinî, tenê dema gund texnekî ma li paş wî. Berî ku rûnê awirên xwe li dora xwe gerand kela girî ket qirkê û hêsrên xwe bê şerm û fedî barandin.

Beko digiriya li ser vê rûreşiya xwe. Di hundurê xwe de nehaskirina wî bi xurtî ji hemû merovan re çêbû. Tevî ku Beko nedixwest ji nuv re çavê wî li yê mala Hecî Elî kevin, lê diva bû vegeriya, lewra hesp û kurkê xwe li şûna xwe hişti bû. Destpêkê

di nava xwe de da û stend berî ku biryara vegeê bistîne.  
Lê dema da xwe ku vegere bi qehr tufî erdê kir û bi gayên  
tembelî berê xwe da gund.

Bi her avêtinek gavekê, Beko bi xwe dihesiya ku ben li qirkê  
tê zivirandin. Bi vî hawayî bi bask şikestî gihîşt gund. Ji tirs  
ku çavên wî li yên xelkê kevin. Beko serê xwe rancedikir, lewra  
ji wî werê hemû kes li gund bi hev re li ser rûreşiya wî dipeyîvin.  
U ew ma hişk li ciyê xwe, dema "xezûrê" wî banê kir:

-Derbas be kurê min. Ne hewcî revê bû. Ma gelo ev tişt bi  
kê re çênabe?

Beko bi dengekî melûl got:

-Destûra min bide ez herim malê.

Bê ku Hecî Elî lê vegeê, Beko derbasî hundur bû, rahişt  
kurk, li hewşê xwe avêt ser hespê û mîna gula ji devê tivengê  
derkeve ji hewşê derket.

Bidûdedengê "apê" wîhatiyê: "Tijîbîrnekî, silavênmin  
li bavê xwe ke û em li bendî hatina tene.

Beko di nava xwe de got: "Lanet li te û bavê min bê û pirika  
ku ez bi we re ketimê!"

Dema gund li ber çavan winda bû Beko hesp sekinand li  
herdu aliyê rê nerî û çend caran li paş xwe jî zivirî. Her tişt  
li dorê bê deng bû. Bi xemgînî Beko axînek kişand, hêdîka  
32

paniya xwe li zikê hespê da, mîna ku hesp mebesta xwediyê  
xwe nas bike, ewjî hêdî-hêdî meşiya. Lê Beko her û her mijûlî  
ser rûreşiya xwe dibû. Ne tenê mijûl dibû, li rêkêjî digeriya  
da ji werta xwe xelasbe. Carna bi dengekî bilind û carna di  
nava xwe de, bi xwe re dipeyîvî: "Ez nema wê tînim -wiha ezê



ji bavê xwe re bêjim- piştî vê rûreşiya han ezê çilo karibim wê bînim; Howeh li vê ecêbê! Tiştê hat serê min! ! U hîn di ser hala re Hecî Elî henekê xwe bi min dikir; "ev tişt bi hemû kesî re çêdibe... Xem nake". "Erê yabo çima na? Rûreşî ne rûreşiya te ye. . . De xwezî ti ba, wê çax min bigota xem nake. . . Xwedêwo recak min ji te heye ku mala Hecî Elî ji kesî re nebêje!!

Lê Xwedê neke, hat ku ez têkevim devê xelkê...

Hew cî ji mi re namîne û tebata min nema dibe."

Di virde hat bîra Beko çilo bi zilamekî re wiha çê bû mîna bi wî re. Ew kes bi dinyayê terqî û piştî pazde salan ji vegeza xwe dît ku rûreşiya wî bûye çîrok. Xelkê ji hev re digotin:

"Kurê me sala rûreşiya fîlan kes çê bûye, yan jî filan kes mir wê salê." Dilê Beko pê şewitî û bi halê xwe giriya. Bi van ramanên han ên giran û nexweş Beko ghişt gundê xwe.

Li malê Hemo tenê bû. Dema kurê wî devê derî derbaskir û çavê wî lê ket ji zû hatina wî ma ecêpmayî ji bo vê yekê jê pirsî:

-Xwedê bi xer bike çima tu wiha zû hatî?

Beko bêmad got:

-Ez naxwazim jinê bînim, loma ez hatim.

Bav bi vê gotinê ma behetî û got:

-Çilo ti naxwazî? (Bav xwest bêje min gotin daye Hecî Elî ne te, lê gotinên xwe negot û bi hawakî din peyîvî.) U xebera guhestina me di nav xelkê bela bûye. Ev ne laîqê me û mala Hecî Elî ye.

Beko cevilî dema bavê wî got "xeber", lê pê re bihna wî hat ber, gava peyv ne li ser serpêhatiya wî bû. Tu rê li ber Beko

nema xeynî bêje:

-Min Sultanê ne eciband.

-Çilo te ne eciband? Ew ji hemû qîzên gund xweşiktire!

Û...

Beko gotina bav di dev de birî û got:

-Dibe lê ez qurbana te me yabo nehêle... Girî kete qirka

Beko û bê ku bipeyîve xwe avêt singa bavê xwe û borînê pê ket.

Bav behetî û ma heyîrî çî bêje. Tu tişt li ber nema xeynî kurê xwe haj bike. Ji bo wilo destê xwe li ser porê wî bir û ne wek adeta xwe bi dengekî nizm jê pirsî:

-Ti ji bavê xwe re nabêjî çî qewimiye, ji mi re bêje, ezê her tiştî helbikim.

Beko da xwe ku bêje, lê devê wî negeriya, ji bo vê yekê bi rengê din peyivî:

-Musîbet bi serê min de hat û rûyê min reşbû.

Bi gotina, "musîbetê" û "rûreşiyê" Hemo bi mijulên xwe dûr çû bêdebarî pirsî:

-Çi musîbet? Çi rûreşî? Kesî girê xwe di te da, yan kesî ew revandiye..?

-Ne.. Lo yabo..

-Çi yabo... Bêje û dilê min rehet bike.

Beko bi şerm peyivî li ser rûreşiya xwe. Bavo lê vegerand:

-Lanet li te be, te ez tirsandim! Ma hewceye ti biqeliqî li ser vî tiştê vala. . . Dema hûn hev bibînin muheremat di nav we de namîne.

Helbet Hemo di nava xwe de aciz bû ji vê xeberê, lê nexwest barê kurê xwe girantir bike jê re got:

-Bihna xwe berde niha, her tişt bi bihna firehî çêdibe.  
Mehek di ser vê gotinê re derbas nebû, bûk guhestin, tevî  
ku Beko nedixwest. Beko sond xwar û got di nava xwe de:  
"Heger Sultanê qala vî tiştî bike ezê wê berdim."

34

Piştî ku berbûk bela bûn, Hemo kurê xwe bir oda bukê. Li  
devê derî di guhê wî de wişwişand: "Bi zilam be û xwe neke  
ehmeq!" Derî li pey girt û vegeriya.  
Dema Beko derbasî oda bûkê bû, awirên wan li hev ketin.  
Zava bê hemd ma hişk li ciyê xwe... Lê kenekî wiha bûkê girt,  
bê ku karibe xwe bigre, kire tîqe tîq. Her Beko çavê xwe lê dizêwirand,  
wê hîn bêtir kenê xwe berdewam dikir. Beko xwest  
bi rûyê wê de bipizîqe û telaqê wê têxe dest, lê devê wî negeriya.  
U mîna kûçikê ji ber dengê tivingê bireve, Beko bi lez û  
bez ji hundir derket.

Di hewşê de li bin guhê bavê ket. Hemo ew sekinand û bi  
daf da pêşiya xwe. Li ber deriyê bûkê bi guhê kurê xwe girt  
û bi hêrsjê re got: "Lawê kûçikji bedêla hinerê xwe pêşî kiyê,  
ti ji ber wê direvî!?"

Sultanê heftekî ma li cem mala zavê, lê Beko her û her nikarîbû  
hinerê xwe pêş wê ke. Ji bo wilo bûk çû mala bavê xwe  
û nema vegeriya.

35

## HESIR U BARAN

Qermîçokên salan di ruyê pîrê de bûbûn xaçîrêkên herikandina  
hêsiran. Pîrê di sikakên bajêr de dimeşiya, tevî ku  
baran dihat ji erd û esmanan. Bi vî awayî hêsirên pîrê û peşkên  
baranê tevî hev dibûn, xweşik ne dihat naskirin, ku şilbûna

mijankên çavên pîrê ji girî, yan ji baranê ye. Pîrê diçû bê ku dîna xwe bide kesên pêrgî hatî. Tenê yek gotin, yek pirs li ser zimanê wê bû: "Kê kurê min Mehemedo dîtiye?" "Kîjan kurê şîrhelal kare ciyê wî pêş mi ke?"

Pîrê berî sê rojan li qelaç û newalên dora bajêr digeriya û her jî ev peyv û pirsên han li ser zimanê wê bûn. Tenê car car-36

na di ber xwe de bi şewat digeriya. Ne dûr e ku pîrê pirsê kurê xweji devî û zinaran kiribû, ne dûr e jî ku bi wan re mîna ku bi kurê xwe re bipeyîve, dipeyîvî. U ne dûre tanî bîra xwe çilo kurê xwe ji destê xwe berda.

Pîra Helîmê ji kure-pista cîrana naskir ku kurê wê çû ye nav pêşmergan. Pîrê destpêkê bawer nekir, çimkî kurê wê tu car derew lê nekiribû. Lê dema çûna wî dirêj kir, dilê wê şetî.

Lê dema ku hevalekîji hevalên wî hat ba wê û pere da dest bi vê gotinê re:

-Mehemed li bajêr karekî baş dîtiye û ev pere ji te re şandin.

Wê çaxê dilê pîrê kete cî, ku bi rastî kurê wê çûye bajêr ji bo kar. Heya sal zivirî, pîrê meh bi meh pere digirtin.

Bi vî awayî pîrê rojên xwe dibuhirand, heger bi xemgînî bû, heger bi qirik talî bû. Lê ne bê hêvî bû. Heya rojekê, lê ne xwezî bi wê rojê.

Çend pîrekên gund li ser kurê wê dipeyîvîn bê ku haya wan ji pîrê hebe:

-Pîra pepûk her meh pera distîne, lê nizane ku heqê xwîna kurê wê ye!.

Bi vê gotinê pîrê hat xwar û ji ser hişê xwe çû.

Dû re kesên gund bi hezar Qur'ana û tirbên ewliya jê re sûnd dixwarin ku gotinên pîrekan ji çav nebarbûyê ye û ji pite-pita wan e. Lê her û her pîrêji wan bawer nekir û kuştina lawê wê di mejiyê wê de meya.

Gelekan ji kesên bajêr çîroka pîrê zanî bûn û pirên wan di pîrê de dinasîn dîn bûn û xurufandin, lê ne nişvê yekem û ne yê dudan bi destê pîrê negirtin.

37

### WINDAYO

Birîn di laşê cwan de çiqas kur û fireh be, heger ne ya mirinê be, wê bighê hev, lê tevî wiha jî birîn şûna xwe di laş de dihêle.

Di xwivistê de; nabêna du kaşan newalek e tevî ku demekê herdû ciya yekbûn jî. Lê nema digên hev. Wiha ji ku dar bê birîn, nema şîndibe. Lê dema dar tevî rehên xwe tê rakirin û li cîkî din tê çandin, wêjîyana xwe berdewam bike, di destpêkê de pelên wê zerdibin û carna jî diweşin. Lê hindik-hindik rehên xwe bera zikê erdê dide. Di vir de şertek heye, divê ev dar bê çandin di axek mîna xwelîya xwe de, yanjî nêzîkayî lê

38

bike. Heger ne wiha be, bêguman, wê dar biçilmise û hêdîhêdî bi alî hişkbûnê, mirinê ve here.

Ev tiştên han li ser şînkayên xwivistê tînin gotin. Lê ku hat û insan ji refê xwe ma? Gelo wê karibe jîyana xwe mîna berê berdewam bike? Bi xwe em zanin dema çûkji refê xwe dimîne, dibe qismetê qertelan. U yan jî ji birçîbûn û qefilandinê xwe davêje bextê insan. Di vir de ne dûre têkeve nav lepên pisîkê

û yanjî nav destê kurekî, ku ji ba Xwedê li nêçîrekê digere.  
Di herdu halan de çûk wê mirinê bi çavên xwe bibîne...  
Lê ku hat û tulûrê hur ma bi tenha xwe (li gel ku ev celebên  
tulûran bê ref in), demek dirêj diponije, heya kêlika ber mirinê  
bilind difire... Demaji ber çavan dikeve gewdê xwe sist dike  
û bi kevirkî xwe berdide erdê.

U dîsa li ser van tulûran; ku hat û ew ket nav lepên insan?  
Wê çaxê, gava xwe dibîne di rewşa dîlîtî de xwarinê naxwe  
heya mirnê. Loma dibêjin ; dema tulûrê hur di cenge de neyê  
kuştin, ew bi xwe, xwe dide kuştin.

U hene hin tulûrên mîna wan bi gewd û rengê xwe, lê dema  
dikevin rewşek teng, dest ji meznatîya navê xwe berdidin  
û mayîna xwe di jîyanê de li ser sergo û beretan didomînin.  
Lê ku hat û insan ji refe xwe ma, gelo wê çi riye bide ber  
xwe?. Wê bi çûk be, yan wê bi tulûrê hur be, yan jî wê qertelê  
li ser bereta be? Ne dûr e, ku wê yê pêşî be, yan jî yê navê be,  
an jî ê sisiya be. Gelo celebekî din ji xeynî van celebên wê hebe?  
Gelek karin bi "na" bersivê bidin, lê ezê hewldan bikim  
ku merovekî bi wan bidim nasîn bi kirasekî din, renekî din  
û bi navekî din...

Navê wî Windayo bû. Ev nav pêve zeliqî piştî vegera wî ji  
welatê biyaniyan... Demek dirêj tê ne çû, navekî nuh bi dû  
ket: Gêjo... Û dûre bê hejmar nav bi dû ketin, dawîya wan;  
Dîno bû.

Dema Windayo, yan Gêjo, yan jî Dîno dimeşîya, kesên wî  
39

didîtin ji hev re digotin:

-Lê biner, malxerabo serê xweji erdê ranake! Tu di bê qey

tim û tim li tiştêkî digere, li tiştê, ku winda kiriye.

Piştî van gotinan navê wî ma Windayo.

-Lê biner, mîna gêja dimeşe. U evjî, ji xwarina goştê berêz û ilmê şeytanî ye.

U hin kes hebûn digotin:

-Xwedê muînçê wî be. Jin û zarokên wî pê re nehatin. U li vir jî kar û cî ji xwe re nedît. Ne dûr e, ku aqilê xwe berde. U di dema dawî de, zarokan, bi hê-hê û keviran bi pey diketin.

Windayo ev gotinên han dadiqurtand û di ber guhên xwe re berdida.

Lê nexweşiyên Windayo, ne ev tenê bûn. Iro ji hemû rojan bêtir, wî cîji xwe re ne didît, çimkî namek ji jina xwe girtibû.

Name wek hemû naman, lê çar sûretên zarokan di navde bûn. Li bin wan hatibû nivîsandin: "Kîjan ji wan ê te ye? Tê bîra te, te zirt û fortê xwe dikir û digot: Dola me Kurda li hemû derê xwiyaye".

Windayo li yê pêşî nerî hinekji şêwên xwe têde dît, lê dilê wî lê rûnenişt. Di yê dudwan de, çav ên wî bûn, Di yê sisiyan de dev û bêvil mîna yên wî bûn û di yê dawî de çen û enya xwe têde naskir. Lê çiqasî Windayo bêtir li wan temaşe dikir, wilo jî bêtir dilê wî li wan dişetî.

Windayo xweş nasdikir, ku yek ji wan zarokan ê wî ye. Lê kîjan? Windayo dixwest bi dil û can, bi berê xweyî yekem şa bibe, lê nikarî bû. Dixwest ê xwe hembêz bike ramîsanekê jê bistîne, lê dilê wî bi awî nedikir. Lewra di wan de didît ê xwe û ne yê xwe û bi vî hawayî zarokê ji piştî wî dibû ne yê wî. Di vir de vegera wî ya welat hat bîrê. Wê çaxê naskir ku dîya wî

çûye heqîyê.

Evarî ji hevalê xwe re got:

40

-Tu zanî li ku dîya mi veşartine?

Hevalê wî bi "erê" bersîv da.

Li ser mezêl, ew û hevalê xwe demek dirêj di nav tirban de gerîyan, lê hevalê wî bi ser gora dîya Windayo venebû. U dema jê pirsî:

-Ma te nedît li ku veşartin?

-Belê min dît, lê gelek tirb niha li dorê çêbûne û dilê min li van herçar tirban dişeete.

Wê çaxê jî Windayo nikarî bû, bi dilê xwe bigrî li ser tirba dîya xwe. Her û her girîyê.wî di gerdenê de ma. Windayo gelekî dixwest bi dîya xwe re bipeyive: "Yadê! va ez hatim, ma çima tu li bendî min nemayî? Yadê qusûra min efû bike, û têxe bin nigên xwe." Lê Windayo ev peyv negotin û riia çav zuha û dilhişk û polî poşman vegerîya malê.

Heger tu li sikakên bajarê me bigerî, bêguman, wê Windayo pêrgî te bibe. Hîn serî li ber û çav li erdê, tu dibe qey li tiştêkî digere. Heger hat û te silav lê kir, wê silava te vegerîne û ji te bipirse:

-Raste, ku teht ji ciye xwe bileqe, tucarî nikare şûna berê bigre? U gelo raste genim di nav ceh de ne kêmî zîwanê di nav genim bi zirare?

Windayo li bendî bersîva te namîine, çimkî wê bifiskilîne û çivekê bide xwe. Dûre dilşewatî borîni pê bikeve.

Ma gelo dîn digrîn?

41



## SERPÊHATİYÊN KALO

Di qontara çiyê de, piştî rakirina kevirên mezin û nehîtan, lêkirina benê ji wan, danhevdana zuxuran û çêkirina şikêran; piştî birîna deviyar û hûnandina sincan li ser benê; panavek nuh paqijkirî mîna zolekê li bedena çiyê ciyê xwe girti bû. Di vê zolê de xerzikek du salî şax û baxên xwe bi haritî berdabû. Dihat xwiya kirin miqatiyetî û hostayetiya xwedî wî.

Ev tiştên han ji dûr ve xwiya dikirin. Dema min nêzîkayî lê kir, min dît kalekî heftê salî, piştîxûz, rî sipî û dêmekî miştî qermîçokên bi salan, bi devekî bê diran silava min vegehand. 42

Kalo bi çavekî kirînê li min temaşe kir. Ez jî bi şal û şapik bûm, rextê li min pêçayî, klaşşînkovek li milê min, bê ku ez xwe bidim nasîn, dihatim naskirin bi pêşmergetî. Kalo piştî nerîna xwe ya tûj û dirêj ji min re got:

-Kurê min xwiya ye ti rêwî yî, te rê şaşkiriye û ji hevalên xwe mayî.

Min bi şanazî û sermeznayî lê vegehand, daku xwe pê re bidim naskirin.

-Ez pêşmerge me û ciyê me ji vira ne dûr e...

Kalo bi çavekî matmayî li min nêrî û got:

Pêşmerge li ser herdu çavên min in. Lê ji bo çî hûn li van deran digerin? -Kalo bê ku bersiva min bibihîze gotina xwe berdewam kir.-Wiqas sal ez li vir im, tu carî axa me xwe bênamûs nekî û nigên leşkerên hikumetê pê lê nekîrin... Ma gelo tu alay û tabûrên wan hatine van dera?

-Na kalo, niha jî tabûrên leşkerên hikumetê li vanderana

peyda nabin.

-Lê we xêr e kurê min?

Piştî rawestinek ne dirêj min jê re got:

-Em li "caşan" digerin.

-Li "caşan"? -Kalo gotina min bi pirsî vegerand.

-Erê Kalo h "caşan", ewjî xayinên millet in, tevî ku ewjî bi navê kurdayetî ban dikin.

Kalo cardî bi matmayî li min nêrî û piştî mijûlbûnek nederêj got:

-Ji kalkê xwe re bêje kurê min, mero çilo weji hev nasdike?

-Binavan... Hegerewnejimebinûşerêmebikin... Mana xwe "caş" in.

Kalo ji min pirsî:

-Ma ew navê we dikin çi?

Di dilê xwe de min got, "heye tune ye ev kalê han bi" caşa" re ye, yan çima baweriya xwe bi ya min nayne û peyvê qut na-

43  
ke." Ji bo wilo min bi awirên tûj lê nêrî û got:

-Helbet dijmin wê navên pîs li me kin, ji bo ku avê li ser xwe zelal bikin.

Kalo bi dilşewatî pirsî:

-Kurê min we gelek ji hev kuştine?

Bê hemdî xwe min serê xwe berda ber xwe û got:

-Gelek...

Kalo bi gotina min re rûnişt, cixare pêça û pêxist, hilmek li ser hilmekê kişand û piştî keserek bi axîn peyivî:

-Ez nizamim rast e, ya derew e... Lê dibêjin di quranê de heye... Li gora gotinên melan hemû tişt di quranê de heye.

Neyse... te çîroka Yûnus Pêxember bihîstiye?

-Ya ez zanim pêxemberek tenê heye, navê wîjî Mihemed e.

Kalo di ciyê cî de got:

-Ela hume selî ela muhamed... Lê kurê min dibêjin sê sed

û şist pêxemberên din hebûn; yek ji wan Nebî Yûnis bû...

Bêdeng min serê xwe hejand û kalo peyva xwe berdewam

kir:

-Ev Nebî Yûnis, heft salan di zikê hût di binê dengizê de

ma bû... Piştî heft salan xwedayê alemîn wî rût û tazî avête

devê dengizê. Wilo çermê wî tenik bûbû merov hestiyê wî tê

re didît. Nebî Yûnis gava çavên xwe vekir xortekî çarde salî

bi herdu çavan kor dît. Koro destên xwe dipeland, ku têkeve

ser riya rast. Nebî Yûnis destê xwe bi alî Xwedê vekir û got;

"Ma Xwedawo gunehê vî kesî çiyê, ku te ji biçûkayî de wî kor

kiriye? U tê bi qedir û izeta navê xwe kî, tê çavên wî sax bikî."

Xwedê teala dua Nebî Yûnis bi cî anî. Xortê kor dît xwe

nedît ji nişkave herdu çavên wî vebûn. Hema di ciyê cî de rapelikî

xwe. Dema çavên wî li Nebî Yûnis ketin, koro yek nekir

dudu rahîşt zuxirên ser devê dengizê û bi tepiza bi Nebiyê

Xwedê ket. Laşê Nebî Yunis wiha tenik û nazik bûbû, mîna

tiliyê mêtayî, çawa tepiz dihatiyê wilo jî di laşê wî de diçû

44

xwar...Nebiyê Xwedê tiştik li ber nema xeynî bêje; "Xwedêwo

ti bi karê xwe zanî. Heger te nizanîba te ew kor nedikir."

Piştî vir Kalo demeke dirêj bê deng ma û ez jî mam heyîrî

çi bêjim. Gelo ji bo çi wî ev çîroka han got. Kalo ziq li çavên

min nêrî û tê derxist ku min meqseda çîroka wî nasnekir. Wî

da xwe û rabû ser xwe, wek kesê ku bêje: "Tu here bi riya xwe

de û ez jî karê xwe bikim." Kalo bi rabûna xwe ji min pirsî:  
-Ma gelo ti nizanî heger xwedê Kurd bikirana tiştê ti dibê  
wê dinya xera nekirna?

Bi vê gotinê min mebesta Kalo naskir, berê xwe da çiyê, ciyê  
ku me lûsê xwe lê çêkiribû...

Wê şevê xew neket çavên min. Her û her Kalo mîna rewrewka  
li ber çavên min diçû û dihat. Gotinên wî li ber guhên  
min dikirin vin-vin wek pêşiya ku girê xwe firotiye kesê  
xewxwaz.

Sibehê, bi rojhilatê re min berê xwe da Kalo. Min ew dît  
mîna dîtina meji hev re cara pêşî. Dema min nêzîkayî lê kir,  
Kalo pêjna min kir û pê re jî serê xwe rakir. Awirên me li hev  
ketin. Nayê bîra min Kalo silava min vegerand, an na, lê  
xweş tê bîra min, Kalo pêre-pêre wek mozqirtkê bi min veda,  
dema got:

-Kurê min heger ti bê karî...Kar li cem min tune.

Bi rastî min nizanîbû çibikim. Heger ne ew ba, ji xeynî vegeê  
tu rê li ber min nediman. Lê kalo mîna ji gotina xwe vegere  
bi tuneke din peyivî:

-Tu xwendevan î? -Bi kurtî ji min pirsî û min jî bi kurtî lê  
vegerand-:

-Erê.

- Madem wilo, pirsek min heye.

-Fermo, -min bersîv da û di nava xwe de got: "Gelo kalo wê  
çi bipirse?"

-Ti zanî çima emji dîkê mirîşka re dibêjin; dîkê Kurman-

45

cî? Navê wî li hemû derê dîk e, lê li cem me Kurda "dîkê Kurmancî"

ye Çima gelo?

Bi rastî di dilê xwe de ez bi Kalo keniyam. Bê yî ku mebesta wî zanibim, min lê vegerand:

-Na, Kalo ez nizanim. Lê çi eleqa xwendina min bi dîkê mirîşka heye?

Kalo dîse bi awirên bêbawerî li min nêrî. Bi alî min ve hat û rûnişt. Bi rûniştina xwe re da xwiya kirin, ku ez jî rûnê. Wî destê xwe avêt kîsê tutinê... Min rê nedayê, ku cixara xwe bipêçe, lewra cixara pêçayî min da dest û pêre jî agir pêxist; da ku cixara xwe pêxe. Kalo mîna cara berê hilmek ji dil kişand. Dû di qulên bêvil û devê xwe re berda. U dûre peyivî:

-Kurê min eleqa xwendinê bi her tiştî heye. Kesê xwendevan dibê her tiştî zanibe. Yan na çi ferqa min û te heye? Kalo li dora xwe temaşe kir û awirên wî li ser asîman man û sekinî. Lê dom nekir, berê xwe da min û got: Heger tu gundiyî dibe, ku te dîtiye çilo dîkê elokan û yên mirîşkan pevdîçin.

Min lê vegerand:

-Ma gelo kî ji Kurdan ne gundî bû?

-Baş e, tevî wilo jî hinin hene, ku gundayetiya xweji bîr kirine...

Ne dût e ti ji wan yekan bî. -Min serê xwe bi "erê" hejand, Kalo berdewamkir: Heger ti dîna xwe bidî pevçûna dîkê mirîşkan bi dîkê elokan re tê bibînî, ku dîkê mirîşka erê bi qelafetê xwe biçûkin, lê zora dîkê elokan ên bi qelafet dibin.

Ne tenê wilo, yek zora çend heban jî dibe. Lewra dîkê elokan alî hev dikin... U belengazê dîkê Kurmancî bi tena xwe şer dike. Bi rastî ti zanî -Kalo dengê xwe hîn bêtir bilind kir û got

-Dîkên elokan ên li wir tîn alî hevalên xwe lê dîkên kurmancî hîç dîna xwe nadin ser hevalê xwe. U feqîro ji bêçareyî direve,

çimkî nikare li hemberî wan bi tena xwe bisekine. Erê birazî dîkê kurmancî çiqasî mêrxase jî, lê nikare bi tena xwe piştadijminbişkîne... Maneheqbû, ku navê wî bi navê Kur-

46

manca ve hat girêdan?!

Bê pêjin ez rabûm ser xwe û hêdî hêdî min berê xwe da çiyê. Piştî ku ez texnekî çûm min li dû xwe nêrî, min dît Kalo bi piştuxzî karê xwe berdewamdike di nav xerzikê nuh-hatî de.. Erê ez çûm ciyê lûsê me, lê pişt re devê tivinga min ne kete sînga tu Kurdî.

47

ŞAÎROKO

Di quranê de hatiye; "heger xwedê bêje bibe, wê bibe.. "Madem Husênê Reşîd bû helbestvan, bêguman tiliya Xwedê Teala tê de heye. Lewra Husênê Reşîd di jiyana xwe de helbestek ji ber nekiribû. Bi gotinên heval û hogirên wî yên dibistanê; bihna şîran neji dûr, neji nêzîkjê nedihat. Lê tevî wihajî Husênê Reşîd bi helbestvanîdengda.. U ev navdariya han jî ne bi derewa bi du ketibû..

Rqjekê ji rqjan Husêno (wiha bang dikirinê berî bi helbestvan be) hat nav hevalên xwe û bi ghiştina xwe şîrek ji wan re xwend.. Hevalan xwendina Husêno ji şîrê nekirin

48

tiştêk. Lê Husêno ew matmayî kirin dema got: "Ev qesîda min e."

Her çiqas heval û hogirên wî jê bawer nekirin, lê kesên ku bi helbestan mijûl dibûn, di vê qesîdê de çêbûna şaîrekî nuh û bi berhem dîtin. Helbet Husên Reşîd peyvên bi pesin li ser

xwe dibihîst. Loma di qonaxa mehekê de çar-pênc şîrên din belakir... Di vir de tu tişt li ber hevalên wî yên ku jê behwer nedikirin, nema xeynî bêjin: "Heger Xwedê bide yekî nabêje tu lawê kê yî." Lê kesên ji helbestan fam dikirin, gotin: "Ma meji we re negot, ku şaîrekî nuh û baş di nav miletê me de ra bûye!"

Piştî van peyvan, Husênê Reşîd kete nav rêzên hozanên welat.

Husêno nema yê berê bû. Ne tenê bi guhertina navê xwe, lê bi guhertina dan û stendina, heya bi kinc û tûnê xwe jî. Di demek kurt de riya xwe berda û dûre por jî...

Guhertina Husên Reşîd dihat xwiya kirin di paye bûna wî de. Loma xelkê di nav xwe de rexne lê dikirin û digotin: "Ev paye bûna han wê wî bikuje." Tevî ku helbestvan ev peyvên han dibihîstin jî ji paye bûna xwe danediket û gotinên xelkê li ber guhên xwe berdida.

Diya Husêno, di destpêka helbestvaniya kurê xwe de ji kêfa re cîji xwe re ne didît. Dê li pêş pîrekên cîranan xwe bi Husêno mezin fikir. U pirên caran jî pesnê wî ji wan re dida û digot: "Roja roj min zanî bû ku Husênê min ne wek bira û hogirên xwe ye.. Lê niha stara Xwedê lê be ti di bê qey wehî tê ser..." Dê gelek caran diçû oda kurê xwe, destê xwe li ser porê wî dibir dianî û digot: "Ez qurbana Şaîrokê xwe bim!" Lê niha piştî ku Husên bi تنها xwe bi şev û rojan di oda xwe de bê xwarin dima û xewa cîranan li wan diherimand, dema bi qîrinên xwe di şevên lal û zîz xelk ji xewa şêrin radikirin, Dê li xwe dixist û ji kurê xwe re digot: "Ne em bin ne

ev şaîrbûna te be!..." Di rojên dawî de dê bi dizîka diçû ziyaretan û xwe davêt ûcaxên ewliyan, dako kurê wêji nexweşiya şaîr bûnê rehet bibe.

Heqê dê hebû, bixurcile û li lawê xwe bipirse li cem şêx û ziyaretan. Lewra di dema dawî de, nema peyv bi Husêno re dibûn. Da ya rastî wî xwe dûrî xelkê û kesên malê dikir. Wê dilê dê di cî deba heger kurê wê li oda xwe rûniştiba. Lê carcara wî dê bê hal dikir..

Diya Husêno rewşa kurê xwe wiha ji cîrana re dida xwiya kirin:

-Mirîşk dire ser motkê,.. Piştî hêkê, dike qidqid.. Lê Husêno her tenê qidqidê dike.

Heger bi tenê gotinên dê bipeyivin emê bêjin ev sê raje ku Şaîr Husênê Reşîd çû bû lûsê xwe.. Geh bi hewar û geh bi qîrçîr deng jê dihat. Carna j î bê pêjin dibû.. Kesî nizanî bû çî di hundur de pêre diqewime. Herkesî bi hewakî texmîn dikir. Helbet hemû bi texmînên xwe re rastbûn,çimkî nizanîbûn dîroka helbestvaniya wî...

Di oda xwe de Husênê Reşîd defterek kevnare pel bi pel diqulupand, dako helbestekê bibîne, ji xeynî yên ku belavkiribûn.

Lê bê fêde bû. Di vir de tu tişt li ber Husêno nema, xeynî ji îro pêve şîira bi xwe çêke. U cara pêşî piştî dîtina wî ji deftera helbestvanekî nenas poşman bû bû. Di ber xwe de digot: "Xwezî min ev defter nedîta û navê şaîrtiyê nehata ser min!"

Peyva Husêno rast bû ku wî deftera şîira dîtibû. Rojekê ji rojan, gava wî hewş dikola dako darekê biçîne, li ber merê tenakak zingarî mişt defter û belavok derket. Helbet Husêno



nizanî bû ev çine û yê kê ne. Lewra heyamê veşartina vê tenekê hîn ew zarok bû. Li gora peyvên Dê êvarekê çend kesan mîna çûkên ku ji ber başoke birevin xwe avêtibûn mala wan. Bi gotinên wan ew "xwînî bûn" Dê û bav ew hewandin, çim-

50  
kî dilê wan dişetî, ku ev rêwiyên han xwiniyê hukûmetê ne. Piştî nivê şevê yekî ji wan bi dizîka belavok û deftera xwe di tenakekê de xist bin zikê erdê, bê ku ji xwediyê malê re bêje.. Di destê elindê de beta weta bûn. Pişt re tim û tim Dê digot: "Ji bo çi wan rêwiyên teneka me dizî ez nizanim. Çima tişteki din ne dizî?" Çîroka wan kesa Dê ji xelkê re deh carî kiribû

..Çaxa Husêno tenekê dît, dilê wî reelî, çimkî hevî kir ku bi ser xezînekê ve bûye.. Ji bo wiha, ji kesî re negot û bi dizîka teneke anî hundur, derî kilît kir û li tenekê geriya. Dema tiştê ku dixwest nedît, bi xeyd kaxez qetand... Tenê li ser defterê sekinî, çimkî xwest nas bike çi tê de hatiye nivîsandin. Defter mişt helbest bûn. Husêno defter hişt û belavok şewitandin. Helbet Husêno, destpêkê bîr nedibir bi van helbestan xwe bi şair ke. Tenê bala wî lê bû ku heneka bi heval û hogirên xwe bike. Lê dema qesîdak kir a xwe, bayê navdariyê li bêvilê xist û serxweş xist.

Husêno bi rojan, heya qesîdak ji ber fikir. Dûre ji ber defterê dinivîsand, dako diztiya xwe veşêre. Uji bo ku rûreş dernekeve, berî bela bûna qesîdak nuh mana peyvên nenas ji kesên zane dipirsî. Piştî bi matmayî digotin: "Gelo çima Husêne Reşîd pirsar peyvên, ku di qesîda wî de tên dipirse?" Wan jî li xwe vedigerandin: "Dibe ji bo ku wan bi cî bîne di qesîda

ku di serî de maye."

Piştî temam bûna deftera qesîdan, Husênê Reşîd sê şev û sê roja ma li hundir heya bi xwe qesîdek çêkir. Ji çend malkan bê mane û qafiye, lê tije peyvên nuh û qelew. Kêm kesan manên wan peyvan nasdikirin. Dema li ser vî tiştî jê pirsîn:

-Mamosta tu nabînî, ku qesîda te, ya dawî bi renekî din hatiye nivisandin?

51

Husênê Reşîd di bin sinbêlan re dikeniya û digot:

-Em Kurd tucarî nabin tişte. Her û her diva be em mîna berê bijîn. Ma gelo hûn nabînin, ku dem hatiye guhertin û pêwîste em ji helbestên kilasîkî xelasbin?!

Guhdarên wî serê xwe bi erê dihejandin.

Di qûnaxa duduyan ji helbestvaniya xwe de, Husênê Reşîd, rîj bi roj dan û stendina wî bi meriv û xelkê re ne xweş dibû. Bi temamî navê dînîtiyê hate ser, gava şevêkê şilfî tazî ji oda xwe derket. Dost û merivan bi dijwarî ew di nav sikakê bajêr de zeftkirin. Wî jî bi felbazî digot:

-Min binixumînin.. Ji bo Xwedê min veşêrin..Ne dûre ku helbesta ku îşev min çêkiriye gelekî giran û dijware...

Tevî wihajî Husênê Reşîd hîn nivîsandina xwe berdewam dike, di warê helbestên hur û bê qafiye. Diya wî hîn ji pîrekên cîran re dibêje:

-Xwezî ne bi rîja ku Husêno bû Şaîrko.

52

SERXWEŞ

'Di darê dinê de, kesî ez ne êşandim,  
mîna nefsa min."

(Jipeyvên hozanekî)

Rojekê ez li mirovekî rast hatim, min di xortaniya xwe de, bawerî û hêviyên xwe têde didît. Li meyxanekê min ew dît. Rihek tofû ne paqij rûyê wî heya ber çavên wî girtibû. Çavên wîjî xar bibûn û di koncalên xwe de çûbûn xwar. Madê wî yê zerhimî bi rengê xwe mîna yê miriyabû. Bi kurtî ez pêrgî

53

serxweşekî bûm, ku tişteki wî û navê insan bi hev re nemabû. Bi gotinek din ew bi xwe mabû rewrewka insan. Di jiyana xwe de rojên xwe dispartin hev û dibuhurandin di parsekiya çend dilopên meyxweşê de. Yan jî digeriya û dima li wan ciyên, ku wê kariba gulpek meyxweşji binê piyalekê yan jî şûşekê vexwe...

Min ew dît,ku bi vê dilêma xwe ya rojenî radibû. Piştî lêgera xwe li ser masan, ciyê xwe li teniştê qumarciyan girt. Bi hawakî wiha li wan temaşe dikir, mirov digot qey hinan ji wan li ser malê wî dilîstin...

Ji destpêkê min qilawizî lêkir. Çavên min lê ketin, gava dilopên mayî di binê piyal û şûşan de bi ser xwe dadikir. Pişt re min bi awirên xwe da dû, heya ew bi ruh û canê xwe di lîska qumarciyan de winda bû. Ev rewşa, ku min ew têda dît hişt pêlên tevizînok, seyrê û matmayî bi ser min de bîn. Lewra ew kesê bi nav û deng ketibû jiyaneke ne qenc. Xwestina naskirina sedema serxweşiya wî çiyê, yan jî kiye, di dilê min de hate xurcilandin. Daxwaza, ku ez pê re bipeyivim bi min re mabû, çimkî di dema dawî de ew bibû benîştê devê xelkê. Nifşekî digot: "Ji cengê reviya û bizdoneke." Celebekî din ji xelkê digotin "Bê ewle bû û ev babetê wî ye." Carna jî bi van

xeberan dihat ricimandin: "Li esl û fêslê xwe vegeriya." Erê min gelekî dixwest ez pê re rûnim da ku ez nasbikim niha ew bi çi zimanî dipeyive. Gelo gotinên wî mîna rengê wî hatine guhartin. Loma min dej masa xwe berda û berê xwe dayê. Dema ez ghiştim cem, min destê xwe bi dilovanî li milê wî xist, heya min çend carî nekir ji xarbûna xwe, ya hişdana lîska qumarciya hişyar nebû. Li min bi giranî zivirî û bi çavên bê ruhnî li min nêrî. Min jî, nerînên wîji hev dernexistin, gelo bi xeyd bûn an jî bi riza bûn. Dîsa zivirî ser lîskevana bê ku ji min bipirse ez doza çi lê dikim. Min jî dîsa destê xwe li milê wî xist. Vêga li min zivirî û min di çavên wî de xwend:

54

"Çi tu ji min duxwazî? Dej ji min berde." Heyaji min hat bi dilsozî min ew ezimand ser masa xwe û min jê re got:

-De ka em bi hev re vexwin.

Bi peyva xwe re min destê xwe bi alî masê vekir.

Li serê min heya nigên min nerî. Ji liclic û doza min, bi tewtihandin dej ciyê xwe berda û me berê xwe da masa min.

Ji nişkive bi dengê ricricî got: "Innema elxemrû welmeysêrû welezzamû welensabû ricson min emelişeytanî fectenibû."

Bi bihîstina vê ayeta quranê ez mam matmayî, lewra cî ne ciyê xwendina quranê bû. Lê min li xwe dernexist û min da

xwiya kirin, ku ez wî nabihîzim. Hîn em ghiştin neghiştin

hema destê xwe avêt piyalê û bi ser xwe dakir, a rast meyxweş

avêt nava xwe. Pişt re destê xwe avêt şûşê û gulpekji wêjî vexwar û da xwe ku vegere. Lê min ew sekinand û jê re got:

-Ez receyê ji te dikim tê bi min re vexwe, çimkî ez hez ji vexwarina bi tena xwe nakim.

Pêşî li min nêrî dûre li şûşê, mîna yê ku bêje "têra me herduyan nake."

Min mebesta wî naskir, loma min şûşak din xwest. Madê wî vebû û pêre rûnişt. Bi rûniştina xwe destê xwe avêt xwarinê. Gepek xist devê xwe û wî xwar, nego dilê wî dibijiya xwarinê. Min jî dixwest ez jê bipirsim li ser xwe, gelo ew min nasdike yan na. Lêji tirsî ku ez bêm bîra wî û dej min berde min jê ne pirsî. Lê min jê re got:

-Ez dibînim tu hebckî westiyayî... Alîkarî ji te re divê?

-Alîkarîji min re? Bi lez peyva min vegerand bi hewakî pirs û matmayî, awirên xwe li hawîdor gerand û bi dengê hêdî ji min re got.

-Tu bi çî karî alîkariya min bikî?

Min bawer nedikir ev serxweşê han kare xwe bigre û bi vî hawayî bipeyîve, min jî mîna wî bi hêdî lê vegerand:

-Muhtaciya te çî be ezê biqedînim.

55

-Naxwe tu dixwazî alîkariyê bi min re bikî... Naxwe wilo!

Ha.. Ha.. Ha.. Bi çî gelo tê alîkariyê bi min re bikî? Naxwe tu Xocayê Xizirî... Yan jî tu Mihdiyê dawiya zemanî...

Ez bi gotinên wî dihesiyam mîna kevira bi ser min dawîşîn:

Erê min naskir ku ew qerfê xwe bi min dike. Heger garson wê bîstikê meyxweş neyna, wê rewşa min ne xweş biba.

Wî bi xwe şûşe ji dest girt û pêre pêre bi ser xwe dakir. Pişt re destê xwe avêt pakêta min, cixarekjê kişand û min jê re pêxist.

Hilmek dirêj kişand û got:

-Muhtaciya min bi vî tiştî heye, -Min naskir ku mebesta wî cixareye, dûre destê xwe bi aliyê şûşê vekir û got:U evjî, lê tiştên

din vala ne.

-Dûre bi tonek din peyivî: Tu zanî ji zûde ez pêrgî merivekî mîna te nebûme. Dibe ku tu ji dinyak din hatibî?

Min bersîva wî neda. Ewjî ma bêdeng. Dûre awirên me li hev ketin. U çavên xwe xistin çavên min û zîq li min nêrî bê ku mijankên xwe bişkîne. Min xwest ez ji awirên wî birevim, lê min rê ji xwe re nedît. Di virde min bawerkir ku wî min naskir. Lê şûna tiştekî bêje wek dîna kenîya. Min nizanîbû wê dawîya wê çiba heger kuxikê hişk ew ne girtiba. Bi vê kuxikê bêhn lê hat çikandin. Ez herbilîm, şaşbûm û mam sar li ciyê xwe. U heçî li meyxa nêguh nedan me. Tenê, piştî xurcîrek dirêj bi kuxikê re hêdî hêdî bêhna wî hate ber. Dure bi dengê melomîrarî ew peyivî:

-Te dît birako, heya di vê musîbeta biçûk de te nekarîbû alîkarî bi min ra bikra!

Deng ji rone herduya biliya. Ji nişkave ricfekê ew girt. Ne ji virde û ne ji wirde pirsî:

-Tu zendikî, ku ez dînim, ne?

Min serê xwe bi na hejand.

-Na... Ez bawer nakim, çimkî hemû min dîn dihesibînin.

Belkî tu ecêbmayî bibînîheger ezji te re bêjim ku gotinên xel-

56

kê li gora dilê mine... Erê bi rastî jî ez dixwazim, ku ez wîhabim.

Lê mixabin! U bîr û baweriyên min ewin, ku serxweşbûn

rengê ji rengê dînbûnê ye. Loma jî ez vedixwim...Erê

ez vedixwim da ku ez xwe wîndî bikim. U ku ew nebedî bibe

-Destê xwe bi alî şûşê vekir- ezê pêrê nebedî bibim ji dinyê.

Tiştê xerîbe îro çiqasî vedixwim ez serxweş nakevim û xem

û kederên min hîn bêtir gur dibin. Bê ku ez zanibim çima, dilê min li te rudinê... Rojaîro şîûrek wiha min girtiye ku nahêle kelegirî ji qirka min derkeve... Erê ez dixwazim bigrîm bi dengê bilind. Ax ez çiqasî dixwazim di himbêza diya xwe de bigrîm... Di himbêza yarka xwe de... Di himbêza dostê xwe de...

Piştî van peyvan Serxweşo serê xwe danî ser masê û ma bê pêjin. Xem û kederê girt ser me. Min xwest wî himbêz bikim, lê rê min têde nedît.. Ji nişkêve serê xwe rakir, bê hemdî xwe min piyalek da dest, wîjî bi ser xwe dakir û devê xwe bi zendika xwe paqij kir. Bi dengê xemgînî peyv berdewamkir.

-Erê pirê cara ez dixwazim bigrîm. Helbet ez dixwazim bigrîm, ne ji bo ku xelk li min bîn şefeqê, lê... Di vir de sekinî û ji min pirsî: Tu dixwazî, ku ez çîroka xweji te re bêjim? Erê çîroka min, nemîne ecêbmayî, lewra her insanek çîrokek wî heye... Sitiranekek wî heye, wê bêje û wê here... Lê çîroka min di pêçekê de mir... Erê birako herkes sirudek wî heye divê ew belabike, lê ya min di zengelokê de ma... Tu bawerdikî min digo ezê sazê wiha deynim ku kesî berî min ne lê xistiye û ne bihîstiye... Lê...

Dîsa ma bê deng û cara pêşî di vê rûniştinê de, min naskir ku "mêvanê" min bi zimanê xwe dipeyive... Lê bê ku ez zanibim çima germbûna gotinên wî ne gihîştin dilê min...

-Tu min fam dikî? Serxweşo pêyva xwe berdewam kir. Ez ditirsim tu ji min fam nekî.

Dîsa bêdengiyê em girtin.

57

Min hez ji keçekê dikir.-Serxweşo ne ji virde ne ji wirde

dest bi çîroka xwe kir- Te tucarî hezkiriye? Ev ne girînge, kes tune ku bi nexweşiya evînê neketiye. Lê hezkirina min ji celebekî din bû. Erê min hez ji wê fikir û wê jî ji min -Bi kêmanî min digo qey hez ji min dike.- Heya, roja xwestina wê hat. Min destê wê xwestji bav û birên wê, wanjî muwafiqiya xwe dan... Helbet wêjî muwafiqe kir. U dawîya dawî roja guhestinêjî hat.-Di virde behna serxweş çû û hat, gotin di zengelokê da ma, serê xwe xist nav destên xwe û ponijî, miri jî nexwest wî bixurcilînim heya ew bi xwe çîrokê berdewam bike.

-Erê -Ji nişkive Serxweşo bi hêrs peyivî- Roja dawetê hat. Di eynî rojê de hinin kes hatin û dergistiya min revandin... Na ne revandin, lê birin mala me ji zavaî din re... U ez hiştim li ber derî, da ku ez di qula derî re binêrim, wê çewa dergistiya min ji keçikanî bikeve.- Peyva dawî ji devê wî derket derneket, heya qîrînî bi Serxweşo ket. Bi barînek dînîti got:

-Ew çi hov bûn û ez jî çi bêrûmet bûm...

Di vir de ew hêç ket. Min xwest wî haj bikim, lê fêde nekir. U gava min jê re got "Emê heyfa te hilînin" di ciyê cî de sar ma û rengê wî hat guhartin, reş xeniqî. Bi nêrînek wiha li min nêrî tu di bê qey min bavê wî kuştibû. Hema agir ji çav û devê wî dibariya. Bi vê tonê jî bi ser min rabû:

-Nexwe tu ji wan î! Tu çi marê korî, te dixwest bi dilopek araq jiyana min a mayî ji min bidizî... Tu... Erê tu, yên wek te -bi hêstirî kulma xwe li masê da. Mîna lokê hêç kef bi devê wî ket û rabû ser xwe. Berî ku here paçê bin xwarinê kişand. Li erdê sênî û piyal li hev ketin.- Erê hûn in ên ku we ez bê bawerî kirim. Laneta şeytên li we bê.

Min xwest wî bi xwe bidim nasîn lê bê feyde bû. Çiqas ez



bi aliyê wî dihatim hîn bêtir har dibû. Heb heb dûrî min ket.

Li ber derketinê li min zivirî û got:

-Tifû li te û alîkariya te be û xwarina te be.

58

Dûre çû û her gavek davêt li min dizivirî û tifi alî min dikir

heya ji ber çavên min ket...

59

### BISTIKEK BÊ RÛMET

Remo mîna rêwiyên din di rêzê de li bendî dora xwe ma. Kesên ku dora wan dihat bi serfîrazî pasên xwe didan polîs û piştî nerînek bi nav nerîn polîs dîsa pasên wan li wan vedigerand. Rêwî derbasdibûn, bi riya xwe de diçûn. Tenê Remo bi tirs destê wî li ser dilê wî bû. Di nava xwe de diqîçqîçî û dikelkilî, dixwest hîn bêtir rêz dirêj bibe, da ku dor negihê wî. Tevî ku zanîbû çare nabe, mîna ku dora mirinê tê ser însan wê dora wîjî bê.

Dema li pêşiyê yek-du kes man Remo çend gotinên ku bi zimanê îngilîzî ji ber kiribûn; di ber xwe de ducarî kir. Gava

60

dora wî hat, wî bi awakî nîvşareza got:

-Eyam Kurdeşin Polîtîk.

Polîs bi pirs lê vegezarid, çimkî gotinên Remo yên îngilîzî bi hawakî ne duristî derketibûn:

-What?

-Eyam Kurdeşin polîtîk.

Vê carê polîs bi çavên kirîn û nebaweriyê lê temaşe kir.

Awirên xwe ji serê Remo ta nigên wî bir û anî. U bi hawakî wiha lê temaşe kir, ku Remo bê hemdî xwe serê xwe bera ber

xwe da.

Herdu demekê li ber hev bê deng man. .. Remo dîsa da xwe ku bipeyive. Lê zimanê wî herbilî û ma bê pêjn. Lê dît polîs her û her awirên xwe jê nabire, nemazeji nigên wî. Heya dilê wî lê şetî: "Ma xwe ne ez ji teyarê xwas peya bûm?"

Dinya li ber çavên Remo çû û hat. Ji wî werê ku kesên li dorê hemû lê dinêrin û li ser bi hev re dipeyivin. Li ber çavên wî bû rew-rewk. Ken bi bilindî û gotinên jê nenas tevî hev bûn. Ji nişka ve ricfek kete dilê wî. Bi xwe hisiya, ku tilîkên nigê wî şil bûn. Nema zanîbû ji xwêdanê ye yan jî...

Di vir de serpehatiyek ji zaroktiya wî hate bîrê. Wê çaxê temenê wî şeş-heft salî bû. Dem çelê fal bû. Çiyayiya ji bêkarî yan bi xara dileyistin an jî kenê xwe bi Hesênê Dîn dikirin. Evê dawîji zikmakî kêma aqil bû û di xortaniya xwe de bi dînîti hat nasîn. U ne wiha ev nav hate ser. Hesênê Dîn û reben di berfê de, di germê de xwas dimeşiya.

Di garsîna gund de, erê rokê tîrêjên xwe diavetin erdê, lê her ava golan qeşa xwe bernedida... U te digo qey ev tîrêjên han bê tînin. Tevî wiha jî xelkên bêkar xwe avêtibûn tengala dîwar û sincan, da ku hinek germê di laşê xwe xin. Tenê Heseno ji serma xwe ji ser nîgekî davêt ser ê din. Remoyê biçûk li teniştê bavê xwe matmayî lê dinêrî. Dûre xwe negirt ji bavê xwe pirsî:

61

- Yabo... Wa yabo çima nigê mi di gora û çaroxan de dicemide, lê Heseno xwase jî ne xema wî ye?

Bav negihîşt lê vegeirîne, lewra yekîji zilaman ban Heseno kir û jê re got:

-Heseno, heger tê bidî nav golê, ji serî heya binê ezê mecidîkî bi te dim.

Kesên li wir Heseno sor kirin û wîjî yek nekir dudo, şerwalê xwe kişand heya kabokan û da nav qeşê. Bi derketina wî te digo qey te nigên wî daye ber qelemtiraşan. Hawîdorê xwîn deherikî. Zilamê ku ev doz li Hesên kir jê re got:

-Ez mecidîyê te nadim te. Ma çima te panekî qut kir. Şertê mi ew e, ku ti bi dirêjayiyê lêxî.

Heseno da xwe ku dîsa li golê xe. Di vir de -û heya raja îro Remo nizanibû çî pê hat. Hima ji ciyê cî êrîşî zilam kir û gezî tiliya wî kir. Qarînê pê ket.. Bû tîqe-tîqa kesên li dorê.

Remo bi xwe şiyar bû dema polîs pirsas navê wî kir. A rast wiha ji Remo hat xwiyakirin, ku pirsas navê wî dibe:

-Navê min Hesênê Dîne -Bi dengêkî bilind bersîv da, lê di nava xwe de digot: Heger ne dîn bûma, ez dahatim vir....

62

\*\*

## HINGÊ

Rojen Barnas

Çîrok

NÛDEM

Weşanên Nf1dem: 30

Hingê

Çapa Yekem: Stockholm 1997

@ Rojen Barnas

Pergala bergê Îl rtîpelan: Ný1dem

Wêneya bergê: Fotografek

ISBN: 91 88592-30 8

Navnîşan:

Termov.52

176 77 Jarfalla-Sweden

Tel ý1faks: 8-583 564 68

NAVEROK

ÇEND GOTIN 3

TE EVÝ ZIMANÎ JI KU DER! ANÎ? 5

DE WERE BINIVÎSÎNE 13

HEFT XWEZIL BI WAN ROJA 13

ŞÎFA BI XWEDÊ YE 37

KA MERNATÎ MAYE? 51

HECÎ MIHEMED ELÝTI QELŞO 61

ÇENOGOTIN

Xwendevanên hêja,

Ev pinûka di destê we de berhevoka çîrokên min ên bi

îmza Flît Totanî ye ku di kovarên wekî Tîrêj û Hêvî de derketibûn:

TE vî ZIMANÎ JI KU DEÊ ANÎ?; Tîrêj, hejmar

1, 1979, DE WERE BINMSÎNE; Tîrêj, hejmar 2,

1980, HEFT XWEZIL BI WAN ROJA; Tîrêj, hejmar 3,

1980, ŞÎFA BI XWEDÊ YE; Tîrêj, hejmar 4, 1981, KA MERIVATÝ

MA YE?; Hêvî hejmar 1, 1983.

HECÎ MIHEMED EUY! QELŞO çîrok nîne, bi temamî

bîranîn e ku di kovara Çira hejmar 1, 1995 de hatibû

weşandin. Bi saya hevalê min î Kevin Mele Mehmûd (Okutucu)

ez gihîştim bextewariya nasîna Hecî Mihemed Elî

(radiyellahû teala enhû). Ji ber vê spasî giyanê rehmetiyê

Mele Mehmûd dikim ku vê bihara çûyî bi qezayeke trafikê

ji nav me çû.

Gava ku me Tîrêj derxist (1979), min di beşê kurmancî de ji bilî "Rojen BARNAS" bi navê Serxas ARDA, Ferîdûn SALAR, Mihemed QASIM û Flît TOT ANÎ jî dinivisand.

Ji wan Flît TOTANÎ înzaya min a çîrokên mîzahî bû. Di pey Tîrêjê de min dev ji înzayên din berda lê ya Flît TOTANÎ çendekî dîtir jî bi kar anî.

Di vê pirtûkê de min zmanê çîrokan - ne bi temamî lê hinek-ji aliyê rastnivîsînê ve li hev rast kir, ku bêguman hin-

3

gê hin şasiyên min ên tewangê çêbûbûn. Ew şaşî şasiyên min bûn.

Ji dewra osmaniya bi vê de heta derxistina Tîrêjê carcarna kovar an rojname bi nav bi kurdî Lêbi zmanê xwe ji sedî heştê - heştê û pênc bi tirkî derdiketin. Nivîsarên bi kurdî yên ku tê de hebûn jî an berhemên folklorîk an jî şî'rên klasîk bûn. Li hember vê, me xwest ku em bidin nîşandayin ger meriv bixwaze dikare kovarek seranser bi kurdî jî derxe. Îddiaya me -di vê navê de jî ya min- ev bû. Ne hingê û ne jî niha tu îddiayeke min a ku ez bi kurmancî baş û bêqusûr dizanim tunebiye û tuneje jî. Şasiyeke din amin a wê gavê jî sergerm iya min a "bi xwerû bi kurdî" nivisandinê bû. Di ferheng an kovaran de gava çav bi hin bêjeyên xwedê-negravî bi kurdî diketim bêy ku li esl û astarê wan bigerim an lê bipirsim bêserûçav min ew bikar tanîn. Ev şaş bû, ji vê şasiyê ez poşman im.

Hejmarên Tîrêjê êdî bi dest nakevin. Çîrokên "Flît Totanî" wek çîrok çiqas hêja ne, çiqas ne hêja ne ez bi xwe pê nizanim, hunê ligora jêhezkirina xwe biryar bidin. Lê ez bi

vê dizanim ku qenc-xerab ew mêweyên çandeya me ya nivîskî ya demekê ne. Hêvîdar im ku bikêr hatibin û bikêr bîn.

Bi vê berhevokê wek îmza êdî wezîfa Flît Totanî bi temamî diqede.

Bi hêviya serbilindî û dilxweşiyê.

Rojen BARNAS

....

TE EVÎ ZMANÎ JI KU DERE ANÎ?

Mêvanekî min hebû. Diviya pê re biçim Diyarbekirê.

Her çiqas pê re çûyina min di ah êê wî de, wê tu bikêrî wî nehata jî, Lêdîsa ji bo qinyata dilê wî diviya pê re biçim.

Me xatir xwest û em ji malê derketin. Zaro li pey me av rêtin, dilê me ket cîh. Piêtî av rêtinê nema êdî tifaq û teêqeले bîn serê me. Oxira me vedibû êdî. Ez biêirîm. Mêvanê min, Mîrxoyê Xano li min zivirî: "Herê herê ... bavê bavê min tê çima nekenî, zanî êdî piêtî vê avrêjê tifaq û teêqeleyên li pê me pûç bûn."

Bi axaftina Mîrxo re dengê selavdanekê ji piêt me ve hat.

Li hindava dengî zivirim, Mele Mihemed Elî. ..

- Rojbaê Mela! Çawan î, qenc î gelo?

- Hemdê bêhed bo rebbilalemîn exî. Di întîzara roja xwe de me. Hema Xwedê ji îmanê û Qur'ana ezîmuêêan mehrûm neke. Ev exiyê me kî ye?

Mîrxo xwe ranegirt. Gotê:

- Na bavo ez ne xî me, ez cibrî me.

Min gotinê ji ber Mîrxo hilanî:

- Mêvanê min e.

- Ya! Ser çawan. Gelo siheta te çawan e exiyê min?  
- Spas. Tu gazineke min nîne ji alî xweêiyamin ve.  
- Elhemdûlîllah summe elhemdûlîllah. Rebbilalenûn kesî  
neke bin darê sihhetê. Rebî mûînê te be. Zanî exî bê teqdîra  
Qehhar, tu zîruh nikare hereket bike. Enkebût daxî bi teq-

5  
dîra qadirê mutlaq dikare bilive. Saniekî, hakinýekî wisa ye  
ku bê mîsal e, layezal e, (bi zanyarî biêirî) maêaallah eqlê  
meriv nagihîje hikmeta ZulcelaL.

Min gotina Mele birî:

- Belê Mele!

Mele dev ji axaftina xwe berneda:

- Maêaallah li hîkmeta Zulcelal binihêre kuro, çiqas hubba  
te di dilê min de heye. Fesubhanallah ji te qadirî re, ji  
xwe tu qadirê kulli eêa yî, lê wellahîlezîm bi qasî hubba te di  
dilê min de ye, ew qas yê tu kesî di dilê kesî de tune. Xaricê  
îmkan e. Rehm û xulýana xeffar; cenahê xwe, ji ser serê te  
sayeî hîfza xwe mehrûm neke.

- Ji te jî Mela.

Mele Mihemed Elî qet dengê min nebir xwe. &1 jî nedixwest  
"tekelluma" xwe bibire. Bi zordana xwe, bêjeyên (kelîme)  
erebî, farisî yên belbî hê ruyê tavê nedîtibin ji tûrikê bîrpêbirina  
xwe derdixist mîna çavîkên rêstina tentena bi hev  
vedikir, dirêst. Hiz, rûmet, siyanet tenê bi van bêjeyên biyanî  
(xerîb) dikarîn bihatina dazanîn.

Lê malava! de ka ev îslamiyetî ye? De ka ji kitêbê êerîetê  
re tê gotin "pirtûkê êerîetê." Kitêb kitêb e, pirtûk pitûk e.  
Xwedê mûînê te be çawa ye, Xwedê alîkarê te be çawa... Di

mûînê, îneyetê, muawenetê de hêzeke xwedayî heye, tê veêarî ye. Lê alîkar?

Em hatin serê sêriyana nav çarêiyê. Min xatir ji Mele Mihemed Elî xwest, ez û Mîrxo ber bi rawesa mînîbusa verêbûn.

Çarêiya mezin ji boêahiya (îzdiham) merivan seremiêt bû.

Ji çûnehatê mîna qula mûristanê dikeliya.

Îsmet efendî di nav deriyê dikanê de li piya rawestabû, li

6

çûnehata rê dimeyizand. Me selav lihevdû kir, Îsmet efendî destê xwe drêjî min kir, me bi destê hev girt, hejand. Îsmet efendî:

- Bûyrin, çayekî me vexwe.

- Gelek spas. Em rêwî ne, diçin Diyarbekirê. Di me bibûre.

Îsmet efendî:

- Allahaêqina bûyrin efendî abêcixim çayeke me vexwe, dîsa tê herî.

- Ne lime heb e. Divê em pêkî zûtir biçin.

- Temam tamam efendim. ýilli navê wî çî ye ezê teleMn kim, ku teqî rabûse bla bê we hilîne.

- Îca bû. Spas.

Em derbasî hundirê dikanê bûn. Îsmet efendî derbasî masa xwe bû, sandalyê nêanî min da, ez derbasî sandalyê bûm,

li sandalyê rûniêtim. Mîrxo jî li ser kursî bi cih bû. Îsmet

efendî li cama camekana dikanê xist, lawikê çayger lê nihêrî,

Îsmet efendî bi tiliyan jê re îêaret kir, sê çay xwest. Drêjî telefonê bû, rawesta, bi destek pakêta cixarê drêjî me kir. Min

û Mîrxo heryek ji me cixarekî ji pakête hilanî. Mîrxo bi hestê

xwe xwest cixara Îsmet efendî vêxe. Îsmet efendî nehiêt.



Gotê:

- Efendim, ev duyê çaqmaxê te ji siheta însan ra zerrarly ye. a pê re hesteyê xwe î gazê jend, cixara xwe vêxist. Telefon derket, Îsmet efendî axaft:

- Alo! Bay Nûrî, ez Îsmet efendî. Du yolciyê min hene, teqsiyê Diyarbekirê hene, tune ne? Heta yarim seetê himmm. Baê e efendim baê e. Tu du qoltix ayirmîê ke, biêîne ber filipîs (Philips) bayîî. Bû canim. Haydê canim îyî gunler.

7

Çayên me hatin. Çayger çaya heryekî ji me da berê.

Min ji efendî pirsî:

- Çawa kirînûlyotina we çawa ye? Firocina we dibe, nabe? Îsmet efendî lêva xwe çJmisand, bi nîv mirûzqusandinî got:

- Sayin abêcixim, ê me emekê lizûmsiz e, em pê re dibînin. Hîç yoqsa çar-pênc milyon eêa di hundir de heye, lê satiê nabe. Efendim însanê vî memleketî aliêmîêê sefaletê, pîsîtiyê biye. Îmkansiz efendim îmkansiz e. Ji me re medeniyet lazim e. Mêrik ber pîreka xwe nakeve yaxut bi pîreka xwe înanmîê nabe ku çamaêir makînesîkî bikire, çamaêirê malê pê yiqamîê ke. Min sê muzîk dolabî anîn, êeêmeh wisa li dikanê ma efêndim. Yekî jê jandarma qomitanî kirî, me yekî da doqtor, yek mabû ew jî rojek xanima qeymeqam hat çav pê ket, me da wê. Bay Selîm ekmek aslanin axzindadir, ekmek qazanc kirin guc biye. Qazanca min a rojê yirtmîê bike rojê ji bîstî (\*) berjor naçe, lê êloxlî di rojê de çarsed pênsed hezarî qazanc dikin. Min ji bayiekî taniê re dûrima

xwe êikayet kir li Îstenbolê, çi bêje begenmîê dikî; got" qardaê im çurumîê dibî." Gêrçektên jî em çurumîê dibin li vê derê. Sayin bay Selîm, tîcaret îêekî qolay nîne birê min. Ellah wekîlin olsun niha sed hezar alacaxê min heye di nav xelkê de. Bavo kes çabûq çabûq nayne borcê xwe nade. Gere tu îstek bikî ku hê bîne. Du roj berê bi sed û pêncî û çar hezar bonoyê min hebû, min çû ji yabanciya, ji esnafa borc stend û udemîê kir. Banqa Mudurî rojek erlelemîê kir, li min beklemîê kir. Babam bû însaf degJ.

Teqsîkî gewr li ber dikanê rawesta, li qlaksonê xist, êofêr bi îêaretan bangî me kir. Ez û Mîrxo rabûn. Min bo çay û her tiêtî spasî Îsmet efendî kir û xatir jê xwest. Mîrxo jî bi destê

8  
wî re girt, malavayî tê da.

Em ji dikanê derketin, rêza pêên ji me re hiêtibûn. Min derê pêên vekir, ez û Mîrxo derbasî cihê xwe bûn, bi cih bûn. Teqsî bi rê ket. Me dîsa bi dest hejandinê xatir ji Îsmet efendî xwest.

Teqsiya me berbajarkê qesebê li pey xwe hiêt. Bi bezahiya xwe re babelîska xubarê ji axê hiltanî. Erebyên ku ji hember me dihatin mîna berikên tilingê, bi vizîn di me de dibuhirîn. Ji hafê ve me didît, Lêdi di hev derbas bûnê de bi qasî çav niqandineke sivik ji hev dibuhirîn.

Rêwingiyek li paê rûniêtî, bi dengê fetisokî û bi borîn ji ajoyê teqsiya me pirsî:

- Min tiêtekî bihîst Felemez, êra rast e?

Ajoyê me, di neynika pêedînê de lê nihêrt:

- Çawa xalê Hacî

Hacî:

- Kufaretî guna be, dibêjin te êevê din tifaqek derbas kiriye.

Ajo:

- Xwedê ewladê te bihêle, Xwedê te xwey ke. Welle te dî qeder e.

Rêwingiyê kêleka Hacî ket nav axaftinê:

- Êra kufaret be Felemezo, xêr be çi biye?

Felemez:

- Lo heyra tiêtê awa tim li pêêiya me êofêran e. Gotineke me êofêran heye: "êofêrin ecelî yol, qarisî dûldir." We diye ku êofêrekî di nav cih û yataxê xwe de miriye? Na ... Min bi xwe nebihîstiye û nedîtiye jî. Ji xalê xwe î Hacî re bêjim: Çûbûm Sêregê, min îêê xwe bîtermîê kir, goriêmê xwe qedand, êdî donmîê Diyarbekrê dibûm. Hatim ber termînalê, Ella-

9

hû alem sîmsar gote min: "himýn diçî, yolciyê min hene bidim te, bibe." Min ji xwe ra got himýn diçim hîç olmasa vala neçim. Wele min yolciyê xwe bîndirmîê kir û bi rê ketim.

Em hatin di qereqola Qerejdaxê de gêçmîê bûn, li wê derê çend wîraj hene, em ji bîrîncî wîrajê gêçmîs bûn, liîkîncî wîrajê donmîê dibûn ku ji ûzaxê sîleh seslen me dûymîê kir.

Sîlah seslen çawa dihatin... Min basmîêê xazê kir û son sur' at yola dewam. Ne ok ne olmaz te dî kîm bik belkî mehkûm bûn weya yolkesan bûn. Wele min da xazê. Erebe di binê me de ûçmîê dibe. Em yoqiêê tirmanmîê bûn, derketin tepê, çi bibînim; çar sed- pênc sed metre li pêêiya me qamyonekê megersem çarpmîêê pezê koçera biye, pez sahiblen jî bi tifinga saldirmîêê êofêrê qamyonê kirine. Min basmîê

ê hênê kir, eyb e eyb... a ku lýên tûtmîê bike tune. Min xazê kesmîê kir, bereket vêrsin li saxê rê çaqJ hebûn. Wextê ku asphalt dokmîê kirine, li ser asphaltê ev çaqJ baê siqiêmîê nebiye, ereba îtmîêê kenarê cadê kirine. Welle min dîreksiyonê qirmîêê saxê, doxrîdan doxriya çaqJin uzen kir. Neysem Elah bîn bereket vêrsin yawaêyawaê xiza min kesJmîê bû, min vîtêsê kuçultmîê kir, hatim nêzîkî wan dûrmê bibim, yolcîkî min go: "basmîêê xazê ke, van koçerana dijminê me ne, zû mese bJezîne, gidî zû. Min erebê taqmîêê îkîncî vîtêsê kir û sur' et dayê û dewamh li qomê xist, dîsa ketim orta cadê. Di orta rê de termê qoyînekî hebû wele min li ortê xist û derbas bûm. Em ji wan gêçmîê bûn, min yekcar sur' eta xwe zêde kir, bîrden çî bibînim qurêûnê tifyinga di ser serê me de çawa ûçê dibin. Dayê dêranê megersem wan dijminê xwe î di erebê de tanimîê kirine, wele ji ecel qorqisî min xiz dayê.

Felemez ajoyê me, serpêhatiya xwe ji niqtê heta bihnokê  
LO

bi rê Ê zê fikir digote me. Li fetlanekê çawa ji rê derketine, çawa dîsa bi heft kul û heft belayî navg"ýnaxwe derxistine ser rê û bi rê xistine; yek bi yek, mîna bengeke (îmajeke) sînemayê ji me ve nepenî di ber çavê wî de derbas bibe digote me. Serpêhatiya wî ya duhî gelek drêj, reng"ýn bû. Digot, digot, digot paêî lê netanî. Paêî lêanýnê nedixwest jî.

Em li Diyarbekirê, li Derê Çiyê peya bûn. Min ji mêvanê xwe î Mîrxo pirsî:

- Çawa, rêwîtiya te çawa derbas bû? Jê kêfxweê?

Mîrxo li min nihêrt:

- Rêwîtiya min xweê derbas bû. Lê Siloyê Sarê hat bîra mýn.

-Çawa?

- Tu zanî, Siloyê Sarê gundiyê me ye. Ji leêkeriyê zivirî, mýna herkesî gundî çûn bixêrhatina wî jî. Pirsî wî kirin, Silo bi tirkîyeke nêr bersîva me dida. Me digot: "Silo lawo bi xêr hatî", Silo xwe pik dikir, digot: " saxol!", "ellerinden upmîê dikim. Himm, me nihêrî ku Silo xwe li tirkî datîne.

Mîrzo Misto jê pirsî: "Silo lawo, çawa gelo tu hînî tirkî bûy nebûy?" Silo gotê: "Lê çawa ugrenmîê kirime." Mîrzo jê pirsî: "Xwedê kî bi tirkî ji kêça re çî dibêjin?" Silo da hiêê xwe, bibîr nanî, lê nebû ku rastiya xwe bêje me. Mîrzo pirsî xwe carî kir. Silo lê zivirî, gotê: "Oooo! Xwedê jê razî tu çûyî pey tiêtê hûrik ketî." Mîrzo biêrî: "Bi Xwedê kî ji heêtira (deve) re bi tirkî çî digotin?" Silo awirê bi leêkerî da "Oooo! Xwedê jê razî, tu jî tiêtê ew qas uskek sormîê dikî." Flýtê Ferho ket nav axaftinê jê pirsî: "Êra bi tirkî ji kera re çî dibêjin?" Silo bi zanyarî biêrî: "Bera hun cahil mane oxil, li wî welatî ji kera re êsek dibêjin." Flýt: "Lê ji daêê wan re?" Silo da bîra xwe bi bîr nanî. Bi kovan serê xwe hejand:

11

'Wele bi piçûkî toqinmîêê wan nedibûn heta buyumîê dibûn. Ku buyumîê dibûn ji wan re jî digotin êsek." pixkîn bi civatê ket, giêt kenîn. Dotira rojê me bihîst ku Silo ji Sêva jina xwe re gotiye: "Sêvê! Sêvê! Êsek qizî êsek, îndir hevanî getir O nanî." Êêêê! Sêvê yeka mêrane ye, di bin gotina wî de ma dimîne. Wê jî gotiye: "Hey la teres! Min rî ser wî zmanî, te ji ku derê anî?"

-0...ê... ?

- Ê û ê. Mele Mihemed Elî, Îsmet efendî û ajo Felemezê we dewsa Siloyê Sarê girtine.

- Lê tu, Mîrxo?

- Hema ez jî Sêvê. De tu ne razî yî ji wan re bêje.

(\*) bîst hezar lîra (Yêwê demê ku mehmiziya memûrekî ji dereca 4, gehîneka bilind 7500 - 8000 lîra bû.)

12

DE WERE BINIVISÎNE ...

Min ji bo vê hejmarê(\*) çîrokek gelek xweê manîdar nivisandibû.

Piêtî nivisandinê, min çend caran xwend,

dû re min ew deqîlo kir. Li ba dilê min gelek xweê bûbû.

Hingî min dixwend yekcar besta min lê vedibû, destê min ji xwendina wê venediqetiya.

Li ser hejmara yekem ya Tîrêjê hin rexne dihatin kirin.

Ev rexne di derxisûsa giran bûyina zmên de bûn. Ez di ber

xwe de dibiêrîm û min ji xwe re digoti "piêtî xwendina vê çîrokê

êdî wê li ser zmên, li Tîrêjê rexneyên neyûû (menfî) neyên

kirin." Ji ber minê barekî giran -yê rexneyên neyûû

(men:fî)- bi vê çîrokê ji ser milê Tîrêjê hilda, kêf li min dibû

berrî, ez dipirpiêim. Qewlî zarûkan ve pîrê ji min re got gilîkî:

"Ka çîroka xwe, berî weêandina di kovarê de bi çend hevalan bide xwendin. Ewê çawa bibînin ... "

Bê êikez ji nava xwe têr, ji xwe razî bûm. Nivîsana min bi

zaravayê kurmancî, bi sivikaW û nermî ji zmanê vê çîrokê

pê ve êdî hew dibû. Ne gengaz (mimkin) bû jî. .. Bi ji xwe

razî bûyin û bi li hêviya pesindayinê mayin, min rahiêt çîroka

xwe nîeanî çend hevalan da. Tebî ev heval ne wisa yên

rastlêhatî bûn, ji aliyê min ve hatibûn bijartin: Yek jê ji Hekarê,  
yek jê ji Dêrikê, yek jê ji Silîvan, yek jê ji Agirî (Qerekose),  
yek jê ji Dêrsimê, yek jê ji Qerejdaxê, yek jê ji Sirûcê  
û yê din ji Cizîra Botan bû.

Bi rastî, li ba dilê xwe min rêke wisa bijartibû ku rexneyên  
13

wan ên derxisûsa zmên ve, wê bibûna ronahî bo zmanekî nîvekar  
(miêterek) li temamê welêt. Minê nivîsara xwe ya niha  
û yên di pêêde li bêjînga wan a zmên xista, da ku bê gazin û  
lome, nivîsara min li her kujê welêt bihata xwendin. Da herkes  
bigota: "Eferim Flît! Meriv bi kurmancî welê divisîne."

Min heval vexwendin malê. Ji feleka xwe bê xeber, ji nava  
xwe razî, nisxayê çîrokê da destê wan. Di alîkî de jî min, ji  
wan re çayeke torinî (hakimî) çêkir, anî li ber wan danî.  
Min qewîtiya xwe li wan kir. Ewê bi tenê di alî zmên ve  
rexneyên xwe bipêdandina (tesbît kirina). Wekî din aliyê  
teknîk û çîroksaziyê bû ku ew pisporiyek (îxtisasek) arizî dixwest.  
Bo ku rexneyên xwe bi nivîsanî bipêdînin (tesbît kin),  
min têra wan kaxiz û pênûs jî anî danî ber wan.

Ya girîng jî bi rastî mijara zmên bû. Lewra li ser hejmara  
yekem gelek rexne hatibûn guhê min an li cem min hatibûn  
kirin. Xwendî an nexwendî, serwext bûyî an serwext nebûyî,  
çi bigire gelek camêr di alî zmên de dabûn ber dasa xwe û pê  
ve diçûn.

Ji van rexnegiran yek jî leqayî min bûbû:

- Êra mandal çi ye?

Ez tê negihêtim, min jê pirsî:

- Çi mandal?

- Di Tîrêjê de yaz dike.
- Têtekî wisa nayê bîra min. Mendal nebe?
- Na na lo ... Mandal, mandal ... Yazmîê dike "ez mandalek çar salî me."
- Xeletiya te heye birako. Nanivisîne "ez mandalekî çar salî me", "ez mendalekî çar salî me" dinivisîne. Tu dêliyayî (êaêî). Rexnegirê me xeyidî, li sûfê min ket:
- Yahoo! Ezê ji çavê xwe înan bikim ya ji te?

14

Min nihêrt emê bi serê hevûdu nexin, ji nerma xwe ve rabûm, ji wan nêzîkan min Tîrêjek peyda kir, anî da destê wî:

- Fermo, ka mandal? nîêanî min de.

Heval kovarê di ser hev re welgerand, ew rûpel vekir, bi xeyd kovarê êîêînav çavê min kir:

- Ha baê binêre!

Min rahiêt helbestê ji serî heta binî du sê car xwend, na mandal tê tunebû. Min îca rahiêt rûpel kir nav çavê wî:

- Ka baê b.meAr"e man da1"e an "men dal"?e.

Baê lê nihêrî, dît ku ne "mandal" e, "mendal" e, vêca ziVirî:

- Pekî mendal çi ye?

Min bêaxaftýn rahiêt kovar jê stend, paja (1) "M" ya piêka ferhengoka kurmancî û tirkî vekir, bêjeya duyem nîêanî wî da. Lê nihêrî û bi dengekî êlî xwend:

- Mendal iki nokta üstüste çocuk.

Îcar ez biêirîm û min gotê:

- Eferim, hêdî hêdî hînî xwendinê dibî.

Hevalekî gote min. Camêrekî çîroka min a hejmara yekem, "Te vî zmanî ji ku derê anî?"yê ji serî ve çend komek



(paragraf) xwendiyê, tebî hetanî paêiyê neqedandiyê, rahiêtiyê kovarê liser masê xistiye û lisûfê hevalan ketiye:

- Ka we digot bi kurmancî ye? Fedî ye, fedî. .. Tev bi tirkî û erebî nivisandine, îca xelkê dixapînin dibêjin ku bi kurdî ye.

Em bizivirin ser serpêhatiya çîrokê û komcivîna rexnegirên wê.

Komcivîn yeko yeko rexneyên xwe yên derxisûsa bêjeyan bi nivîsanî liser kaxiz pêdandin. Raberizîna (mînaqêe) li ser bêjeyan dest pê kir. Ji bilî min, heÿ heval hebûn; lê dýnna 15

du kesan jî ber bi hev nedixûn. Pîveka (qistas) herkesî derxisûsa bêjeyan de, bêjeyên devoka wan a pêwarî (mîntiqê) bûn.

Kesî nedixwest ji kuta xwe dakeve, herkes bi bêjeya devoka xwe digirt û digot: "Ya kurdî jêza (orîjîn) ev e, yên din an biyanî ne an jî çêbiwar in (sun'î).

Bêje gelek bûn, bê hejmar... Raberizîn pêêiyê ji bêjeya "axaftin" ê dest pê kir. Di vê mijarê de hevalê Hekarî li rex min cî stend û ev bêje parast:

- Axaftin bêjeke tam kurdî jêza ye. Li temamê Cûlemêrgê, li Behdînan, li nav Kurmancên Îranê tê bikar anîn. Bêjeke durist û di cih de ye. Tu bêjeyên dinê, yên di hin devokan de têtin bikar înan dewsa viya nagiritin.

Hevalê Dêrikî bi hêrs êrîêê dibir ser û digot:

- Ka ez ji we giêtan dipirsim, limala, li gundê, li bajarê kîjan hevalên mayî" axaftin" tê bikar anîn? .. Kes nikare bersîva vê bi erînî (misbetî) bide. Li Cûlemêrg û Behdînan tê bikar anîn ji me re çî lazim e. Divê "peyvîn" bê bikar anîn.

Li temamê dorhêla Mêrdînê û li Ciyarbekrê "peyivîn" tê bikar anîn. Pêtî ku Ciyarbekrê jî "peyivîn"ê bikar bînin ew çax mersele namîne. Kî dixwaze bla here qehwên ber postexana piçûk li Ciyarbekrê, an jî here qehwa li seriya Gara Sîrkeciyê li Stembolê, bla ji xwe re binihêre ka li wan deran çî tê bikar anîn.

Ew qehweyên herdû ciyan jî qehwên Dêrikiyan bûn. Hevalê Sýnvanî xwe ranegirt:

- Ku em bi ya Dêrikiyan bikin, divê navê Diyarbekrê jî bikin Ciyarbekir.

Heval gêt kenîn. Hevalê Sýnvanî domand:

- Belê rast e, "peyivîn" li dorhêla Dêrikê (lihevalê Dêrikî zý.v. ýn") binih' e"re ne "C"eê.1 " e, "D"e.êl" e h a.i Be1e" li dorh"el a 16

Dêrikê Û ji aliyê Dêrikiyan ve tê bikaranîn. Dîsa dibe ku "axaftin" li Hekarê û li dorhêlên wê bê bikar anîn. Lê ev herdû bêje jî li temamê welêt nehatine belav bûyîn. Ji ber vê qasê bikaranîna wan ne durust e. Divê, di dewsa vê bêjeyê de ya belavbûyî "xeberdan" bê bikar anîn. Ev bêje ango "xeberdan" li temamê Diyarbekrê, Sêrtê, Mûêê tê bikar anîn. Ji ber vê lazim e, ev bêje bê pejirandin (qebûl kirin).

Hevalê Agirî gotina wî birî:

- Na xêr, ne li Mûêê û ne li dorhêla Agiriyê ev hersê bêje jî nayên bikaranîn. Li Mûêê, li Bîngolê, Li Erzerûmê, li Qersê welhasil li temamê dorhêla Agirî "qisekirin" tê bikar anîn. Ji me ve "axaftin", "peyivîn" êtên xerîb in. "Xeberdan" jî ne di mana "konuêmak"ê de ye. "xeberdan" ewe ku meriv ji hinan re xeberan dide, çêra bi wan dike. "Xeberdan"

ewe.

Hevalê Dêrsimî rexneyên xwe yên der vê xisûsê bi vî awayî anî:

- Hun dizanin ji ber Dêrsim deverek çiya û bilind e û ji ber kapîtalîzm û kultura romê bi derengî ketiyê, bi qasî der û ciyên dinê asîmîle nebiye, xwe ji asîmîlasyonê parastîye. Ji ber vî, bêjeyên li Dêrsimê tên bikar anîn, ji aliyê kurdî jêzayî ve girîng in. Divê em viya ji bîr nekin. Li Dêrsimê tu kes bi "axaftin"ê, bi "peyivîn", bi "qisekirin" ê nizane. 'xeberdan" jî di mana "kifrîkirin" ê de ye. Ez nabêjim ku ev pirs ne rast in, lê ya durust "qezîkirin" e. Li çarmedorê Dêrsimê "qezî kirin" tê bikaranîn, divê Flýt jî vê pirsê (bêjeyê) bikar bîne. Hevalê Qerejdaxî: .

Na ji vana yek jî ne durust e. Ya durust "galegal kirin" e. Ez filan û bêvan nizanim. Merkeza devoka Diyarbekrê Qerejdax e. Kanî û serkaniya zmanê kurdî jî Qerejdax eý lazim

17

e "galegal kirin" bê bikar anîn. H ew qas!

Li min zivirî:

- Fht, dev ji tiêtên virloqî berde.

Hevalê Sirûcî Lêzivirî:

- Oxil ... oxil ma te xêr e? Galegal ji qijtîna pîrekan re tê gotin. Çi ye, ew qas hun li ser vê êorê disekin. Kurdandîya vê êorê "êor kirin" e. Ji xwe re herin nav eêîrên berazan, dunan, pîjan, gawendiyan ... Herin Sirûcê, herin Sûriyê. Bigerin oxil. Herkes "êor kirin" ê diemihne. (Destê xwe li masê xist, hêrsa xwe anî) Di nav çar dîwaran de rûêtine li êorên kurmancî digerin. Wayê min raberî we kir, herin ji xwe re

bibînin. Şorên zêde ne lazim e.

Ji masê rabû ku here, hevalê Cizîrî rakir milê wî:

- Kî ve diçî, ez benî? Bo çi diinirî? Ka rwînit ez bişexlim.

Dû re hevalê Cizîrî li me zivirî:

- Ez benî li min fekin. Tu kes nikarît înkâr kit ku merkeza edeb, ilm û irfana kurdî ne Cizîr e. Kultura kurdî bi Melayê Cizîrî dest pê dikit, heta îro têt. T emamê êair û alimên Kurd bi Kurmanciya Cizîrê nivisandine û dinivisînin. Zmanê Cizîra Bohtan çî bigirit biye zmanê resmî yê kurdî. Lazim e Fht di dewsa vê pirsê de "êtexn" biemilînit.

Axafî:yn axafî:ynê vedikir, lihev drêj dibû, dibû mîna werîsê êixrê. Dumahîk qet lê nedihat. Bêjeyên ku li serê li hevûdu nedikirin gelek bûn. Li ser bêjeya "firingî" haêr çêbû. Ê ku li ser "bacanê sor" bi temamê hoza xwe disekinî, yê ku li ser "domat" biryara xwe diyar dikir, yê ku digot îla ewê "êamik" be ... Helahelakî mezin bû. Nizanim tovê vê zêzewatê bo çî hat nava me. Gelo ew jî ji bo berhevdanê hat? ...

Min êdî dev jê berdabû. Ka dibêjin ya; agir berda kayê û xwe da aliyê bayê ... Yê min jî çî bigire ketibû delavekî wisa.

18

Kesî guhdariya min nedikir. Bi rastî kesî guhdariya yê dinê jî nedikir. Tiqûtenê herkes bêjeya devoka xwe ya pêwarî pêênîyar dikir û li serê jî ku biva wê serê xwe jî bida êkandinê. Li ser bêjeya "mendal" jî gelek hat axaftin. Herwekî "axaftin" ê der vê xisûsê de jî gelek pêênîyar dihatin. "Sebî", "ged" e , "tifa,1" "we1ed" ketibuAn dora rab'enzýAneA. LAe raben.zýAna mezin mijara "zarûk"ê bû. Li ser bilêvkirinê qiyamet dihat rak.ý.nn. Çar dAýtî hebAun lý' ser veA:" zaêA, l"" zamA, "" zarok" ,

"zaro" ... Kesî nêzîkayî bi dîtina hevalê xwe nedida, her yek bilêvkirin an bêjeya devoka xwe ya pêwarî dumstir didît. Raberizîna bi teêqele bi saetan ajot. Derengê êevê bû. T emamê bêjeyên bi êaret-kirî neqediyabûn, lê, ji bêwextiyê heval rabûn. Yên mayîn hiêtin rojeke dinê.

Heval giêt rabûn çûn. Lê ne bi êêla gava hatinê bûn. Giêt bi êêla pisporê zmanzaniya kurdî, pik û bi qubequb ji mala min vediqetîn.

Min kaxizên nivîsara çîroka xwe berhev kirin, lê mêyizand, malikê tu xirab nebî. .. Çi bibînim baêe gelo? ... Çi bigire ji sed bêjeyî binê heftê bêjeyan her hatiye xêz kirin. Ev tê wê maneyê ku ev bêjeyên binî xêzkirî giêt dê bihatina rexne kirin. Ronahî ji çavê min, qidûm ji çokên min briyan.

Min kaxizên xwe tof kir, avêt êebakê.

Du roj êûn de hevalekî min î nas bû mêvanê min. Ew jî di tenga xwe de li ser kurmancî radiwestî, lê digerî. Erebî û farisiya wî jî ne xirab bû. Tebî wî welê digot, ne ku min bi erebî û farisî dizanî û li gora zanîna xwe zanîna wî ya derxisûsa van zimanan dipîva. Di hindava xwe de li ser etîmolojîya kurdî dixebitî.

Êvarê qederekî dûr û drêj me suhbet kir. Şevbihêrka me li

19

ser alûbalê dinê bû. Hêdî hêdî senniyanê me herduyan jî qediya, di binê kîsikên me de êdî tiêtek nema. Wê çaxê min rahiêt kaxizên çîroka xwe ya navdar anîn da destê mêvanê xwe. Bi hêviya rexneyên wî yên derxisûsa zman ve jê daxwaza xwendinê kir. Heval di mana erê kirinê de serê xwe hejand, daxwaziya min pejirand.

Heval du rêz xwend û bi bêjeke rastlêhatî re bîranîneke xwe gilî kir. Her giliyên bîranîneke wî çî bigire nîv saet dajot. Di du saetan de hê hatibû nîvê rûpela yekem. Bîranînên wî malmîratî ewqas pir dihatin bîra wî ku ji bextê min î reê û ji ê çîrokê re dor nedihat ser xwendinê. Ji bawîêkan devên me herduyan jî, ji deqê carek çar buhist ji hev ve diçûn, hindik mabû ku biqeliên.

Hevalê min kaxizên çîrokê li hev nûrand, danî ser masê.

Gote min:

- Tu zanî, ez gelek bê xew im.
- Wisa be em razên.
- Şevbaê!
- Şevbaê!

Em herdû jî ketin nav nivînên xwe. Min lembê bihart.

Mêvanê min cixarek vexist. Gote min:

- Êra Flît, ew çîroka te bi Zazakî ye an bi Soranî ye?

Ez li hev dêliyam, min pirsî:

- Kijan çîrok?
- Ev çîroka ku di destê min de bû.

De were safî bike, tê çawa safî kî? Ez qehýnm:

- Ev çîrok bi Hewramanî bû.
- Ya? ..

Ez yekcar qehýnm:

- Belê ya.

20

- Tu Hewramanî ji ku derê hîn bûy?
- Hewramanî? ...

Belê.

- Gelek hêsa ye.

-Çawa?

- Ji lîngafonê lîyîn bûm.

- Ya! liser xêrê be. Pir baêe, pir baê...

Serê sibê em rabûn. Min xurînî hazir kir. Li ser xurîniyê me axaft. Di nav axaftinê de bêjek derbas bû: "Hêçandin" ...

Mêvanê min pey bêjeya "hêçandin"ê ket, pirsî:

- "Hêçandin" çi ye?

- Lêker e, ango fiîl. Tirkiya wê "denemek" e.

- Bi kîjan zmanî ye?

- Bi kurdî ye.

Serê xwe di meqamê neyînî de hejand:

- Na. Ne xêr ne kurdî ye. Ku kurdî bûya minê pê bizanibiwa.

Nana, ev ne kurdî ye.

- Bê êikwisa ye.

Min ev gotin bi tinaz gotibû. Bê êik ne wisa bû. Min jê pirsî:

- Te diye bi tirkî "denemek" heye, kurdiya wê çi ye? Zanî gelo?

Serê xwe hilda, pêlek li arîkan nihêrt. Bi êêleke pisporî û zanistyarî fikirî, herdû birhên xwe hildan, dîna xwe li niqutekî daçikand:

- Di kurdî de du sê pirs (bêje) tên emilandin (bikar anîn):

Yek jê ji van "cêribandin" e, lê ev pirs ne bi kurdî ye, ji erebî tê; "cerebe", "carib", "tecrube" û hwd tev ji mesderekê dizên.

"Sihêtî kirin" heye, ew jî ne bi kurdî ye. Hema bihna

21

erebî jê tê.

- Lê bi kurdiya wê çi ye?
- WellaW di nav xelkê me de "qûna hev dîtin" tê emilandin.
- Malneket, ev ne argo ye? ne mustehcen e?

Li min nihêrî:

- A!... Ew çi behs e? Xelkê me kîjan gotinê biemilîne, emê jî wê kelîmê û wan kelîmatan biemilînin.
- Baê e, bi serê min neket. Lê em bêjin ku wisaye, emê hevoka "bir çok deneyimlerden geçtik" ê çawa wergerînin kurdî?

Bi awirek manîdar 1 min nihêrî, pêve kir:

- Gelek hêsa... Em di gelek qûnahevdîtiniyan de derbas bûn.

Di ciyê xwe de êemirîm. Êdî axafî:in ber bi min neket. Mêvanê min rabû çû. Ez zivirîm hundir, min piyan û feraqên ser masê dan hev, masê ma1êt. Kaxizên çîroka min a navdar bi stûxwarî 1 min dinihêrîn. Min rahiê kaxezan 1 hev tewand, kir ber çavîka sobayê û da ber pêta kibrîtê, lê bi vê telqînê:

- "Ey çîrok! Di pêvajoya rexneyan de te gelek" hev dîtin"iyan derbas kir. IYîrok alîkarê te be.

(\*) Tîrêj, hejmar 2, 1980

(1) Ji Ferhenga J. Blau, paj: qisim, perçe, beê

22

HEFT XWEZIL BI WAN ROJA

"... Ew çi roj bûn yaho ew çi roj bûn?! Bi zêran, bi milyonan paê ve nayên. Ne wisa? Li ser bextê min, min bizaniya wê paê ve bên, minê deh mJyonê xwe bida serê. Himm ... Tu çi dibêjî Sebrî efendî?"



Sebrî efendî di nava herê û nayê de li Neco, li Necatê Hacî Mûsa axa dinihêrî. Hevalên hev ên zarotiyê bûn. Lê niha Sebrî efendî li Îstenbolê di karekî de dixebitî. Navê karê wî tune bû, lê karekî baê bû di aliyê dravîn de. Necat efendî tepek li çoka Eliyê Şêx Îsa xist û domand:

- Tu zanî? Ez û Sebrî efendî di taxekê, di kuçekê de mezin bûn. Mîna du bira. Nan û ava me cihê diçû lê wekî dinê em herdû bi giyanekî bûn. Heta pirê êevan an ew li mala me an ez li mala wan, tevî hev radizan. Tê bîra te Sebrî efendî? Te dî rojekê mêrikekî çiyayî li ber derê me tirî difiro. Her libeke wê wekî hêka kewê bû. Zikrikê wî yê xêrê be, pîçê Niyo, Nîhadê EvdJrezaq efendî jî hat ba me. Çû bi ser qatûvan de xwar bû, li tirî mêyze kir, fîkand. Hat ba me, çav kir, got: "We tirî dît, çi tirî ye... Av bi devê min ket." Min gotê: "Tu dibêjî em çawa bikin?" Gote me: "Hun dengê xwe nekin." Niyo mîna rovî li dora mêrik çeçlebaska da. Pîçbav "xalokî" diqunfîne, yê nizanibe wê bêje ku vana xal û xwarziyên hev î ji di in, qet av di navbera wan de darbas nabe.

Wele Niyoyê me êalûsiya kir, xweê kir, xwe bi mêrik êîrîn kir. Alîkariya wî ya fuotanê kir. Êdî xalo pê baweriya xwe anî. Pîç Niyo ji xalo re got: "Ha vî lawikê ha heye ya, ha vî  
23

kurikê ha ... " Sebrî nîean da. Mêrik li Sebrî nihêrî, deng nekir. Niyo dîsa, îca bi niçandin gotê: "xalo ha vî kurikê ha heye, tu zanî, sêwî ye. Çiqas gune ye ne wisa? Bê dê û bave rebeno. Sêwiye bê dê û bê bav pir gune ne, ne wisa?" Xalo limin û Sebrî nihêrî, bala xwe da me. Drûvê sêwiyan bi min û Sebrî nediket. Niyo çav kir me, serê xwe hejand.

Em herdû jî çûn nêzîkî wî ve, çûn cem. Niyo, pîç Niyo destê xwe yê rastê avêt stuyê Sebrî, destê xwe yê bi êîqal di serê wî da, çû riyê wî. Bi awakî pê gunê xwe anîn, gotê: "Na birê min, qurbana serê birakê xwe, dilê xwe bi xwe meêewitîne." Mêrikê xwediyê tirî mit û mat bûbû li Niyo û Sebrî dinihêrî. Niyo li mêrik zivirî, gotê: "Xalo hinek tirî nadî Sebrîko? Tu diliûû çiqas gune ye." Hê xalo dengê xwe nekiribû ku Niyo rahiêt gûêîkî kafîyn da destê Sebrî û destê xwe di serê wî da, gotê: 'Xêra dê û bavê xalo be! Jê re dia bikî, erê?" Sebrî rahiêt tiriye xwe û ji wê derê dûr bû. Niyo rakir gûêîkî jî da min, gote: "Xalo tu dizanî? ev jî bê dê ye." Min zû zû rahiêt gûêiyê tirî û ez ji wê derê dûr bûm. Mêrik rakir ciqilekî da destê Niyo, Niyo rahiêt ciqilikê xwe hat ba me. Me tiriye xwe xwar qedand. Lê em tamijîn. Tu nizanî Elî efendî ew tirî çiqas xweêbû. Niyo got: "Neco lawo em çawa bikin, ez têr nebûm. Hun jî têr bûn, têr nebûn?" Min û Sebrî me herduwan jî stuyê xwe xwar kir. Niyo, pîçbav hêdî hêdî çû hevsarê hêstirê ji dîreka elektrîkê vekir, bi destkêê bi qasî neh-deh metran ji wê derê dûr kir, hat ba me, pêêiyê kevirêkî avêtê paêiyê pê de niêkave qîriya. Hêstir veciniqî û revî. Haya xalo jê tunebû, bi tirî firotinê bill bû. Carke din, cartirke dinê bi hêstirê de qîrî, hêstir da bezê. Xalo zivirî li pey hêstirê nihêrî, malikê tu xirab nebî. Wele ji efendiyê xwe re bêjim, mêrik pey hestirê ket. Niyo berî zarokan da, ji dora

24

qatûvên tirî. Ku kes nema, me 1. vî ah û 1. wî alî nihêrt, na kes tunebû. Wele kafirbavê Niyo qatûva bi nîvî da ser milê xwe û me da dû. Em çûn nav baxçê me, serê kaniyê û wele

em 1. ber tiriyê xwe pehn bûn. Me tiriyê xwe wê rojê giêt qedand.  
Lê dotira rojê xêrûxweê 1. we, kevir û kuç 1. me barî.

Heftekî em vîrikî bûn. Haaaa hah haaaa haaaa haaa Sebrî  
bi xwe de kiribû.

Hesenê Heza Çawîê, piê kema giêtan qediya gotinê ji Necat  
efendî stend:

- Heqîqeten Necat efendî wê çaxê pir xweêbû.

Wekî ku tiêtekî nû dîtibe û bi giringiya wî hê nû zanibe,  
êêleke ecêbmayî da rûçikê xwe, serê xwe pê re 1. rûv alî bada  
û domand:

- Yahoo Necat efendî! wê çaxê gundî wekî îro rûnbûn, birê  
min. Ehmeq bûn, bizdonek bûn. Wekî dewaran bûn. Wê  
çaxê qereqola cendirma 1. hemberî mala me bû. Xweê tê bîra  
min, rehmetiya diya min tu car hundir û hewêê nedimêt.  
Serê sibê emê rabûna, dayika min a rehmetî ew qasî ku nivîn  
hi1tanî, emê derketina derva. Ku gundiyeke di ber deriyê  
me de derbas bibûya, wê bi tirkî gazî kirayê: "Hê kurdo gel  
bûra!" Yê gundî wê bihata, rehmetî wê pê axurê, navmalê û  
heêê bida ma1.êtin, çend neqil av pê bida anîn û dû re berî  
dayê. Pirê caran berava me jî ew pîrek mîrekên mastfiroê dikirin.  
Ji bavê wan zêde bû ku bêjin em nakin. Bi gotineke  
rehmetî, cendirme ewê wî merivî bavêtina qereqolê, têra dilê  
wî lêxistina, dotira rojê hê berdana.

Necat efendî bi tinaz biêirî, 1. Sebrî efendî û E1.yê Şêx Îsa  
nihêrt, dû re 1. Hesen zivirî:

- Memîê onbaêê hebû, tê bîra te?

Hesen soromoro bû, bi dengekî lertzok:

25

- Erê Lêçawa. Em cîranê hevdû bûn.

Necat efendî xwe li nezanî danî, domand:

- Navbera mala we û Memîê onbaê wê çaxê gelek xweê bû.

- Lê çawa, gelek xweêbû. Ji rehmêtî re digot "ana". Diya min jî wî wekî kurê xwe dizanî. Çên wî yên êûêtinê hebûna, tanî, rehmetyê jê re diêûêt. Carina cendirmekî li ber dJê wî goêt, zêzewat, fêkî tijî dihat. Cendirme digot: "onbaê gotiye, min bêriya xwarina destê "ana" kiriye, bira êvê çekin ezê êvarê werim." Ew qas ku di navbera me de tekepeke tunebû. Carina dihat, ez li ber derî rûniêtîme, dipirsî, diya min û bavê min ne li malê bûn; wê bigota: "tu ji mewija hez dikî Hesên?" Min dengê xwe nedikir. Ewê pênc quruêê wê çaxê bida min, bigota de baz de Hesên! Here kakJ û mewîjan bikire. Minê darikek ji xwe re bikira hesp, lê siwar bibûma, bida tirada. Ezê biçûma dikana Xalit efendiyê kor, ewê herdû berîkên min tije kirina kakJ û mewîj, ezê têr li çarêiyê bigeriyama dû re bihatima malê ku wayê Memîê onbaê hê li ber derî ye.

Necat efendî:

- Ji min tirê Sûnaya xwiêkate dergistiya wî bû, ne wisa? Mirûsê Hesên tirê û tehl bû. Eniya wî wekî cotê kirav rakirî xêz bi xêz bûn. Bihna wî di gelpikê de bû grêk, neçû û nehat. Necat efendî keysa wî dabiyê. Lewra herwekî Necat û Hesên û kesên li wê derê, herkesî pê dizanî ku Sûna dosta Memîê onbaê biye, çend car derûcîran wan tevîhev îpela tazî qefaltine. Lê ji ber dê û bavê wê deng nekirine, razîbûna xwe pê anîne, wan jî his ji xwe brandine. Lewra di wê dem û

dewranê de onbaêikî ne wek Memê, lê cendirmekî bejik dikaribû du sê gundan bide ber xwe û bi lêdanê heta qesebê bî-

26

ne. Dîsa di wê demê de ku sîleyek li cendirmekî bihata we-êandin; ew gund an qesebe bê pirsûpirsiyan bi hêsayî dihat êewitandin. Çav Lê girtin an bêxîretiya der û cîranên mala Heza Çawîê di xisûsa keça wê ya Sûna û Memîê onbaêi de, ji vî sedemî bû. Sûna li aziyê nema. Tevî ku jê zarok hatibû jiberkirin jî dîsa ji xwe re mêrekî dît. Pêêiyê mêr kir, paêiyê ji mêrê wê re bi xedemetî karekî ji karên dewletê hate dîtin. Ew kar jî bi xêra serê Heza Çawîê û Memîê onbaêi hat dîtin. Necat efendî tafilê xwest wê tirêayiya serçavê Hesên û wê hewa nexweê hilîne. Di vê mijarê (mewzû) de jêhatî bû. Herwekî ku tu tiêtek nebûbe dest bi axaftinê kir, mijar ji ber Hesên hilanî:

- Bi rastî jî wê çaxê pir xweê bû. Gundî mîna dewaran bûn. Ka serbûriyeke xwe bêjime we. Ji efendiyê xwe re bêjim, wê çaxê dikana bavê min hebû; malê metroyê, cil û caw difiro. Tebî ji bajêr bi metroyê dikm û bi gazê difiro gundiyan. Wê çaxê isûl wisa bû. Rojekê liber dikanê bûm, Hacî jî çûbû ser milkan. Danê êvarê ye, yekî gundî hat dikanê, pirsî "xwarzê barûda firotinê heye?" Min lê nihêrt. Ez hê wisa lê dinihêrim, min dît Kemalê êagirdê Hemze ostayê terzî gazî kir. Bi tirkî gote min: "Min ji te re malek êand." Ez têngê-tim. Neyse ji efendimê xwe re bêjim, min serê xwe hejand; "ha tu çi dixwazî?" Mêrik dîsa gote min "barûd heye barûd?" Min gotê: "Barûd ... Ka wesîqa te heye?" Mêrik li min nihêrî: "Wesîqa çi?" Min gotê: "Haydê yelah ez bê wesîqe

barûdê nadim, serê xwe nakim teêqelê." Wele mêrik li ber lavayiya pehn bû. Rakir pênc banqinot drêjî min kir, bi hêvî û dexalet. Wekî ku gunê min pê hatibe, min wisa mirûsê xwe dilovankî kir: "Gunê min bi te hat, heke ne wisa biya minê nedana te. Lê dîsa bi sozek ku tu ji tu benî ademî re

27

nebêjî ... " Mêrik soz da min. Min rakir pênc banqinotê wî jê stend, min gotê : "Binêre barûda reê e, ha!" Gote min: "Erê bavo mala te ava, riyê te spî." Wele ez çûm ba KemaL. Efendiyê xwe re bêjim berê terziyan ûtiyê komirê bikar tanîn, min rahiêt xwelî-meliya komirê kir nav kaxizekî, baê li hev lefand, anî dayê. Û dîsa min qewîtiya xwe lê kir: "Binêr ji kesî re nebêjî ha!" Efendiyê xwe re bêjim mêrikê min û te çû, lê dotira rojê selam û eleykum hat bi ser dikanê de. Bi ser bavê min de kir xirecir, ha ku me dît xalê min î Hemze keya derket. Ê xalê min î Hemze keya baêbekçî ye. Baêbekçî ye ema forsa ku li wî hebû li generalekî îroyîn tune. Xalê min ket dikanê, bala xwe dayê xirecira mêrik û bavê min e. Bi tirkî ji bavê min meselê pirsî, min tafilê gotin ji ber bavê xwe hilanî û gotê: " Xalo viya barûdê ji me dixwaze." Mêrik qîriya, wariya, naçar ... Xalê min rakir bi milê wî girt bir qereqolê. Li qereqolê goliko soro te çi xwariye, dixwî naxwî ... Wele mêrikê me yê gundî hem dêlva barûdê ve bi pênc banqinota toza komirê kirî, hem kutan xwar, hem êveke di tewla hespan de ma û hem jî dotira rojê sedbanqinot cirma xwe da, hê filitî. Yaho berê alem bû alem. Ew alem û kêfa berê li ku derê û ya îro li ku? Sebrî efendî zûq bû li nav çavê Necat efendî nihêrt:

- Êlan bênamûsbav! carek ji riyê te min hindik kutan xwar?

- Çi car?

- Cara di dewsa donê gazê te av firot mêrikê gundî. Mêrik bi rê de lê warqilî û hat bi ser bavê min de. Bavê min jî têra min limin xist.

- Haa mesela don ...

- Eliyê êêx Îsa ket nava axaftinê:

28

- Bavê Sebrî efendî, rehmetiyê xalê Nûrî merivekî bi merhemet bû canim.

Necat:

- Kî bi merhemet bû?

Eliyê Şêx Îsa:

- Xalê Nûrî yê rehmetî.

Necat:

- Bavê Sebrî?

Elî:

- Belê, bavê Sebrî efendî.

Necat bi tinaz biêirî, li Sebrî zivirî:

- Efendî! rehmetî çawa bû?

Sebrî:

- Baê bû. Xwedê wî bi rehma xwe êa ke.

Necat:

- Ew qewad baê bû? Qewadbav! ...

Sebrî:

- Lawo çima ji qebraxê bavê te yê Hacî ne çêtir bû?

Necat:

- Ku tu wan bidî ber hev, gotina min jê re tune, eêhedûbîllah.

(Li Elî zivirî) Tu zanî rojekê ez û Sebrî ji mektebê dizivirîn dihatin nanê nîvro, li ber deriyê me em ji hev veqetîn.

Diya Sebrî ne li malê bû. Sebrî çû mala damarya xwe firavînê. Ez çûm hundir min çentê xwe danî, rahiêt nan û penêr derketim nava derî, min dît ku - ew Lalê hebû ya ew Lalê, ya ku pars fikir - Lalê hat ber deriyê mala Sebrî. Ji alîkî ve nan û penêrê xwe dixwim, ji alîkî ve li Lalê dinêrim. Welê carekê min dît ku wehêê kemê xalê Nûrî; ew qebraxê bavê viya ji hundir derket, pêêiyê gotê: "Ha Lalê çi berhev dikî?" ji alîkî ve jî li der û dora xwe nihêrî. Dît ku her alî xa-  
29

lî ye, kes hýne, hiêk bi qevda destê Lalê girt û kiêand hundir, dû re derî girt. Min bala xwe dayê ha derên tune, ha derên hýne; wele ez hêdî hêdî, bê dengderxistin çûm ber derî. Min guhê xwe da derî, wayê pixkepixa Lalê ye. Wele ez sivik rabûm çûm mala wan a dinê. Min gazî xatiya Sakîne kir. Lê min jê re got ku yeka parsek ketiye hundir, derî jî li xwe radaye û malê dide hev. Ez û xatiya Sakînê bi hev re hatin ber derî, ew bi derencê ve hilkiêê derket ber derî, ewilî dengê çengel bi çingýn hatý dû re derî vebû û Lalê ji hundir derket.

Lalê û xatiya Sakînê bi serî li hev qelibîn û doxîna xalê te yê rehmetî jî di dest de. Wele xatiya Sakîne li ser piêtê xerîqî, ket. Xalê Nûrî yê rehmetî hat cendekê wê bi kaêkirin bire hundir. Lê ji berevkî de jî digot: "Sakîne! bi qurbana serê te Sakîne ... Sakîne hû çi bû ji te?!" Min gotê:

- Xalê Nûrî! ew çav bi Lalê ket wisa bû. Ez gazî der û cîranan kim, bla werin lê binêrin, erê?



Ji alîkî ve jî ji pîçîtî dibiêirîm. Li min nihêrî, seranser li min mêyizand, gote min "here lawo, here malê" Ez hatim ber derî. Dîsa zivirîm û min gotê: "Ji kesî re tiêtekî nebêjim ne wisa?!" Têgihê ku ez bi tiêtekî dizanim. Wele nemerdî nekir, destê xwe avêt berîka xwe. Banqinotek ket destê wî, drêjî min kir, da min. Got: "Na na ... Ji kesî re tiêtekî nebêje. Here bi vî pereyî ji xwe re tiêtekî bikire."

Li Elî nihêrî:

- Ez jî li ser gotina te me. Rehmetî ewqas bi merhemet bû ku dJê Lalêya bê zarûzman jî xweê dikir. Ne wisa Sebrî efendî?

Sebrî efendî:

- Lawo ez çî zanim. Tu nebûyan bi bavê min de tînî. Xwedê ji shýyê te bixwaze.

30

Necat:

- Ê qebraxbav, ew roj danê piêtî nîvro li mektebê me wî banqinotî bi hev re nexwar? Ez çiqas dihatim dikanê bavê te kakil û mewîj nedikir berîka min? Ma nayê bîra te?

Li Hesên zivirî, kenek ji zikê têr kir:

- Subhaanelaaa ... îro meselên min û te diçin û tên li ser kakil û mewîjan dicivin. Ev çî îê e, Hesên efendî?

Hesên bi zorê biêirî, lê birîna wî ji kûr ve bû. Dizanî ku bi vê gotinê Necat efendî kevir davêje forqîtiya êka wî ya Sûnayê. Ev kayê kevin bû ku dihat bakirin. Tafilê bi xwe ve hat, li xwe dananî. Herwekî ne jê re, ji yekî dinê re hatibe gotin, axaftin ji ber Necat efendî hilanî:

- Necat efendî, xêr û xweêiyawê çaxê hebû. Bihn û bereket,

qedir û qîmet, însaniyet wê çaxê hebû. Herkes bi ciyê xwe dizanî wê çaxê. Gundî bi gundîtiya xwe, bajarî bi bajarîtiya xwe dizanî. Hedê bavê kê bû bi êevsîleh berdin. Di navbera vira û bajêr de qamyonek dixebitî, lê hedê bavê gundiyan bû ku lê siwar bin. Ji xwe ji eskeriyê heta eskeriyê ancax riya gundiyan bi bajêr keta. Îro tu dibînî ehlê qesebê bi mînîbusan diçin bajêr, lê gundî tenezul nakin bi mînîbusan herin bi teqsiyan diçin. Ji ber vê ye ku bihnûbereket, qedir û qîmet rabiye, nemaye. Te dît, wê çaxê çiqas xweêbû. Gava ku yek biçûna bajêr, yek bi yek ji derûcîranên xwe xatir dixwest. Digot: "De bi xatirê we. Xêra xwe min helal kin. Çûyîn heye, hatin tune, hatin heye dîtî tune ..." Merivên wî yên nêzîk hetanî ber qamyonê wê pê re biçûna, wî verêkirina. Lê îro ... navbera vê derê û bajêr biye saet û nîv. Diçî û têt qet haya kesî jê tune. Wê çaxê ma bi vî awayî bû? Ku bavên me diçûn bajêr di veqerê de ji mezinan re cil û caw, ji zarokan re êekir tanîn. Şekirê sorê qulat. Me ew bi benik ve-

31

dikirin, dikirin xirxal û davêtin stuyê xwe. Niha ew êekirê qulat jî nema. Berê kê dikaribû goêt bikire û bixwe. Gundî çî bigire piraniya qesebê jî nikaribûn ji salê du caran goêt bixwin. Wê çaxê hin yên mîna me eêrefên qesebê yên xuyanî ji heftê carekê du caran dixwarin. Wê çaxê qesabek an du qesab hebûn di qesebê de. Lê Îro ... panzdeh in, bîst in ... Hetanî nîvro piça, pirtika goêt namîne. Tev jî ji êrêkirina gundiyan. Gundiyan qesebe li ehliyan heram kirine. Îro pereyên ku bi gundiyan re hene, bi me eêrefan re tune. Malên wan giêt bi awakî modern raxistî ne, yên me hê li ser sêra

berê.

Eliyê Şêx Îsa, ji qabilê ku xweya wî jî di vê xwarinê de hebe ket nav axaftinê:

- Efendim, yê ku gundî li ser serê me bi serûçav kir dewlet e. Ev sûc, xeta, guneh û xirabî yên dewletê ne. Dewlet e yê viya li me kir. Dewlet. .. dewlet... dewlet...

Di "dewlet" a pêên de Albay(\*) Yasîn di ber derî de derbas bû, di "dewlet" a duyem de guhê xwe mûç kir û li hundirê dikanê mêze kir, di "dewlet" a dawîn de ket hundir.

Giêt rabûn piyan. Necat efendî bi destê wî girt:

- Bi ser çavan re efendim, bi xêr hatî.

Albay Yasîn dengê xwe nekir, derbasî masê bû, li ciyê ku ji Necat efendî vala bûyî rûniêt. Necat efendî di navberê de bangî çaygerê qehwê kir û hat li ser kursîkî bi cih bû. çayger hat, Necat efendî pênc êîr xwestin. Qewîtiya êîrê baê anînê ji bîr ranekir. çayger çû. Necat efendî ji çavîka masê pakêta cixarê ya amerîkanî derxist, pêîyê pêêkêêAlbay kir û dûre li yên dinê gerand. Pakêt danî ser masê, nêzîkî mevanê bi qedir.

Albay Yasîn pirsya yek bi yekî kir. Navê wan, karê wan,

32

gund û bajarê wan yek bi yek. Tiêtekî jê ve biyanî nema. Şîr hatin, belav bûn. Albay Yasîn qurtek li êîrê xwe xist, lêvên xwe alast:

- Baê e, êîrê wî ne sor e. Devê meriv naêewitîne.

Giêtan bi hev re lê zivartin:

- Belê efendim, ne sor e. Devê meriv naêewitîne.

Albay Yasîn, li Eliyê Şêx Îsa zivirî:

- Ez hatim we dev ji suhbeta xwe berda. Ez nebûm maniê suhbeta we ne wisa?

Necat efendî li hêviya Elî nema:

- Hêvî dikim efendim. Ew çi gotin e? Bi hatina we em gelek dilxweê bûn.

Albay Yasîn:

- Ê ... wisa be, li suhbeta xwe bidomînin.

Necat efendî dest pê kir. Ji xweêiya berê, zept û repta berê, razî bûyîna ji jiyana berê, hatina gundiyan û qesebê, hovîtiya gundiyan a berê û li ser serê bajariyan rabûna wan a îroyîn, ferqiyeta forsa bekçîkî berê û paxav pênekirina bi generalekî îroyîn ... Kurtiya gotinê ji serî heta niha digel hev çi axafübûn, giêt yek bi yek li ber mêvanê xwe î nû rêtin.

Mêvanê nû bi pênuşa xwe li ser rojnamê hin îêaret xêz dikir; carcama "ya?! wisa ha? hela hela... Ê wekî din?" digot û bi wan dida nêandayin ku guhê wî her li wan e. Gotina Necat efendî yê "xwezlla ev milyonên min bh nebûna Lêew rojên berê paê ve bihatina. Ji bo wan rojên xweê minê milyonên xwe bida" di serê wî de dizimiya. Daweta qîza xwe ya Aycan bibîr anî, cihêzê wê... Hel-la hel-la ... Ew albayekî dewletê bû lê bi milyonan nikaribû biaxife. Lê ev lixwegirê (muteahid) zêzewatfroêê eskeriyê bi milyonan diaxaft. Bi wan zênewatê rizî, fêkiyên kurmî milyonan kar dikir ha?! ...

33

Bi rastî milyonên Necat efendî yên wî yên arizî nîn bûn. Çar tevkar bûn. Bi her çaran hê milyon û nîv - du milyonên wan diqediya. Niha dev ji begiriya zêzewat û fêkiyan berdabûn, dest bi ya avakirinê kiribûn. Lê bla qet. Albay ji

qîza xwe re sarincek (bûzdolabî) kiribû, Lêhê makîna cilêoyê nekiribû. Dabeêa (teqsîd) deynê sarincê hê serê vê meha ha qediyabû. Hê çi lazim bû ... Digel van diviyahiyan ew ji reê û pergala dewletê, ji ya îroyîn xweê bû, lê ev çavsorên ha ne razî bûn. Na! na! ev jî anaêist bûn. Ne razî bûyina ji dewletê ha bi çekdarî, ha bi vî awayî .. , Ma cihêtiya wan çi hebû ji hev. Hem jî di vê rewêê, di rewêa gerandina awarte (sý.kyyönetim) de. Albay dîsa bi wan re niqirand: "Yal . hel-la hel-la ... " Manyeto kir, rakir ahîzê, rawesta "( ) nirnro grêde", ji pakêtê cixarek kiêand, kir nav lêvên xwe. Li Necat efendî nihêrt. Necat efendî rabû ser xwe, bi hestê xwe cixara wî vêxist. Albay hilm lêxist, duyê wê di firnikên xwe de belav kir. Bi wî serî re axaft:: "Ez Albay Oü1mesin. Çakýr baêçawîê bide min."

"Kayzer"ke(\*\*) leêkeriyê li ber derî rawesta, baêçawîêek û çar cendirmê rapêçandî jê peya bûn, ketin dikanê. Albay Yasîn rabû ser xwe, gote baêçawîê: "Van efendiyan bibe, di ciyê mêvanan de biezimîne."

Her çar efendî di nava zencîra çar cendirman de li "kayzer" ê siwar bûn. "Kayzer" bi lez ji wê dûr bû.

Dotira rojê serê sibê, di navbera du cendirman de Necat efendî derxistin hizûra mazûvan. Albay Yasîn kaxizê îfadê wan dirêjî Necat efendî kir: "Pêêiyê bixwîne û dû re Îmze ke." Necat efendî kaxiz seranser xwend. Reng û rûçik lê guherî, mîna miriyê ji bin gorê derxistibin wisa reng jê çû. "Li ordiyê heqaret", "piçûk dîtina hêzên çekdarî yên dewletê",

34

"li hember pêêeçûna ekonomýk ya welatî propaganda kirin",

"dewrana yekparl:îtiyê bo gundiyan wek dewra zilmê û dîktatorî dîtin", demokrasiyê û pergala makeqanûna êêst û yekê ji bo ehlê qesebe û bajêr neqenc dîtin, lihember vê pergale di nav gel de propaganda kirin", "welatîyên me yên ezîz; tucarê bajêr û qesebê di têkiliyên danûstandina bi gundiyan re bi sextekarî û hîlebaziye sûcdar kirin û bi vê riyê di navbera wan de tovê neyartiyê tovkirin ... " Necat efendî û hevalên xwe bi van sûcan dihatin sûcdarkirin. Albay Yasîn Gülmesin pê re qencîkê kir, jê re vana got û madeyên wan ên di qanûna cezayê de jî yek bi yek vegot. Necat efendî piêtî îmza avêtinê, bi destûr dana Albay telefonê hevalê xwe Selîm kir. Bi dengê nîv girînî gotê: "Selîm çi bivê bike, me bifilitîne." Paê zivirî cem hevalên xwe. Her sê efendiyên hevalên wî rabûn piya. Sebrî efendî pirsî: "Çi bû?" Necat bi kovanî biêirî: "Yasîn im, Gülmesîn im, ez hatime, we dixesînim." Pê re jî bi qevda destê xwe yê çepê bi enîeka xwe yê rastê gîrî:, destê xwe yê rastê kir kulm û zendê xwe yê rastê bi wî awayî drêjî wan kir.

Roja heêtan hatin berdan. Serê wan bi leêkerkî tevî simbêlan kurkirî bû. Necat efendî heta sê mehan derneket derva. Berî derketinê bi sê rojan, vexwendînameyek (dawetiye) stend. Bi du saet dû stendina vexwendînameyê re zîvkir Evdilmecîd hat malê; zincîreke zêr da Necat efendî, dêlva wê ve çJ hezar banqinot ên 1972-3 bi jmartin stend û çû.

Şêva sêyem salona gai'ynoyê mîna hewima masiyan bi dev re bû. Daweta qîza Albay Yasîn bû. Necat efendî jî di nav vexwendîyan de bû. Di qutiyê de zincîra zêrîn bire da bûkê, bûk û zavê herdiwan jî piroz kir. Albay hat ket rojê wî bi

ber bufeyê ve bir. Li ber bufeyê çend zabit jî hebûn. Albay  
35

du wiskî xwestin, wiskî hatin. Albay û Necat efendî piyanan  
ji xweêiya hev re hilanîn. Piêtî vexwarinê, Albay ji komê re  
got: "Hey .. , hey!. .. heft xwezJ bi wan rojan, hey gidî dinya  
ew rojên berê çi roj bûn ... " Li Necat efendî nihêrt: "Ne wisa  
Necat efendî?!" Çav di nav serê Necat efendî de gir bûn,  
gewr bûn. Riyê wî zer bû. Lê dîsa bi xwe êihitî, got: "Belê  
Albayê min. Heft xwezJ bi wan rojan, lê bi xêra serê sê sed  
û çJ hezaaaa ... hezarr ... hezarî. "Gotina xwe hê neqedand,  
li hev êeê, gurmîn ji betonê çû. Necat efendî xerîqî, li erdê  
bû terê û ma.

(') albay: mîralay, colonel

(') trêmbêla pêt vekirî ya bar û kesan, Jestkira alman, marka kaiser e.

36

### ŞÎFA BI XWEDÊ YE

Doktor Xelîl Îbrahîm beg derbasî ber masa xwe bû. Pelekî  
ji bloka reçetê kiêand, raêt pênûsê, "Cembelî" nivisand,  
tarîxa rojê avêtê. Li aliyê çepê "R" ke bi dûvik a bi rî-  
êiki bi lêh"ýnbûyin û bi lêrûniêtina destan kiêand. Ev "R" ya  
ha, kî zane belkî ya sed hezarî, belkî ya pênc sed hezar û  
pênc sed û yekê bû ku bi wê xêz kiêandina h"ýnbûyî dihat ki-  
êandin li ser pelê reçeteya saya. Li piêt Doktor beg, du dîplomayên  
camekankirî bi dîwar ve daleqandî hebûn. Yek jê ya  
Fakulteya Tibê ya Îstenbolê, ya diduyan jî ya pisporiya êêkên  
hundirîn. Di navbera herduwan de jî dîsa nivîsaneke camekan  
kirî; bi tîpên gir û bedew xwe pijî nav çavên seredanan  
dikir: "ŞÎFA BI XWEDÊ YE". Kêmasiyek tê de nehiê

tibûn gelo? Ji min re wisa dihat, herwekî; "êifabi Xwedê ye, el hukmî lîllah"yl wahîdun qehhar" an jî "êifa bi Xwedê ye, amîn". Bi rastî dumahîka wê bi zelaî nedihat bîra min lê ji min re herwisa dihat ku kêmasiyek tê de heye.

Doktor Xelîl Îbrahîm reçete nivisand, binî îmza kir. Drêjî min kir, bi dengekî dilovanî lê ji perdeya bilind gote min:

- Van dermanan tafilê pêk bînin. Nebî nebî bi derengî keve.

Divê saet lê nebuhire.

Min rahiêt reçetê jê stend:

- Belê ez benî. Spas! Deynê me ez benî?

Doktor beg kurt birî:

- Hezar bes e.

- Hezar?!

37

- Belê ... belê hezar bes e. Hun ne xerîb in.

pirçûk bi canê min ve hatin, miyên di canê min de pij bûn, destê min rehih. Min rahiêt hezar lîrayekî ji nav dravên kaxizîn kiêand û danî ser masê. Doktor beg tafilê bi tevgereke hînbûyî rahiêtê kir berîka xwe ya rastê ya pantolon. Min baê bala xwe dayê, destê wî mîna yê min nedirehih. Ber bi derî ve meêiyaý berî ku derî lime veke, gote me:

- Şîfa bi Xwedê ye.

Bavê min bersîv dayê:

- Sedeq amenru bîllah.

Doktor lilawikê dergevanê xwe yê di salonê de fetih:

- Dora kê ye? Bila bê.

Lawik bi dengekî kuêpene û rûniêtî bang kir linexweêan:

- 27! ... 271... Hejmara 27 ya kê ye?



Zilamekî tevî pîreka xwe ji ciyê xwe rabû.

Ez û birayê xwe yê Cemîl ketin bin milê bavê xwe, em derketin salonê. Ziyayê zavayê min û Mîrxanê pismamê min çengî min û Cemîl kirin, bi zorê rahiêtin herdû çengurên bavê me û ji me stendin. Em herdû bira fere kiên.

Ji cem doktor rasterast em çûn "Hotel King"ê.

Otobusên Bedlîsê ji wê derê ango ji Diyarbekirê bi gelemperî piêtî heêtê êvarê bi rê dikevin. Gava em hatin otêlê hê saet yek û nivê paê nivro bû. Nexweê me, yê rûniêtin û gerê nînbû. Jê re vezelandin û razan diva. Tekîn li pêrg"ýngehêdinihêrî.

Ji mêj ve me hevûdu dinasî. Her çiqas bihatima Diyarbekirê li vê otêlê dimam. Di her hatina xwe de jî min bexêêeke hêja dida Tekîn ku ji bo hatina di careke dinê de, bêtirîn limin binihêrin, hay limin hebin.

Tekîn odeke bergehferêh û hênik da me. Me nexweê xwe bir bicîh kir. Bi pêêbîra dermanên di reçetê kirîne dakêim  
38

jêrê.

Saet çar û nivê paê nivro bû. Di xwêdanê de êJopJo bûbûm. Li serê çariyana ber Mizgefta Nebî, êerbet&roêan tasên xwe yên êerbetê wek zengJ lihev dixistin û diqîrîn:

- Ava sûsê, bavê min ...

Dengê yekî bi dengê bilintir dengên dîtir dinixamt:

- Bavê Elo livê ye brê min! Bavê Elo livir. ..

Bavê Elo navdar bû. Çend caran min jê ava sûsê vexwaribû, bi rastî jî ya wî ji DJ ava sûsê bû; bi bihna xwe, bi çêja xwe ava sûsê bû.

Mîratên lingên min bi min re nedikiên. Di vê helekela

Tîrmeha Diyarbekirê de ji Deriyê Serayê heta Merkez Bankê,  
ji Deriyê Çiyê heta Deriyê Mêrdînê, ji ber Minara Çarpê  
heta Deriyê Êrlayê tu dermanfiroê nemabûn ku yek bi yek  
bi peyatî lê negeriyabim. Bersîva gêtan jî bi kurtebirî: "Tune  
... "

Bavê Elo tasa nû spîkirî, ji bJbJîka kûpê êerbetê heta ber  
dev dagirt, dirêjî min kir. Min rahiêt tasa sifir, bihno bihno  
jê bi firkirinî vexwar.

Westiyana min ne ji rêveçûnê, ji hêrsa bû. Ji hêrsa derman  
peydanekirinê ... Gava ku diketim kîjan dermanxanê, çi êagirt  
çi osta çav bi reçeta destê min diketin, herwekî ku ez  
polîsê nependî yê narkotîkê bim û hatibim ji wan eroîn an  
morlîn dixwazm wisa bi mirûzekî tirê, bi awirên çepel li min  
dinihêrîn û bersîva neyîniyê didan min. Di destpêkê de, li  
çend ciyan, ez di xwe de ketim êikê: Li derva li ser camekanê  
bi tirkî "eczane" dinivîsî, lê gava diketim hundirê dikanê;  
beqaliye, etariye çi bêjî tê de hebûn. Kûpên cam ên kolonya  
û lewenta vekirî, marqe bi marqe û celeb bi celeb êûêeyên  
qolonya di refikan de rêzkirî, sabûnên bihndar marqe bi

39

marqe Ê cur bi cur, qavqavkên xemilandî û giranbiha, memikên  
pinkan celeb bi celeb, berdilk û derpiyên pinkan,  
leystokên zarûkan yên ser avê û yên bejayiyê, qaz û werdekên  
nylon, bot, êlek û simîdên avjeniyê, boyax, êe û firçeyên  
por, neynikên pîrekan, mûçink, macûn û firçeyên diranan,  
pêlavên lasûk ên sporê, destmal û pêjgîrên kaxizîn,  
podra, rûj, merhem û dermanên bedewiyê, sutyenên pîrekan

...

Gava ji dikanê derdiketim min dîsa bala xwe dida camekanê, belê li serê "eczane", "pharmacie" û bi tîpên yûnanî tiê-tek din nivîsandî bû; bi maneya etariyê "parhýmeri" filan lê nenivîsandî bû.

Min li ser hev sê tas ava sûsê fît kir, tasa vala digel heqê wê da Bavê Elo, zivirîm otêlê.

Gava ketim navdera oda bavê xwe, bi nûzîn, nalîn û nirrîneke tevlihev kir birrebirr:

- Tu liku derê yî? çûy kîjan cehnimê?
- Min bi stûxwarî bersîv da:
- Çûbûm ku derman bikirim.
- Te kirî?
- Ne xêr. Mixabin min peyda nekir.

Bavê min yek car inirî, bi borrebirr:

- Siktir be ji pêê çavê min here. Warê kor! Meriv dibê qey xweynê ji belika guhê te berdane. Bêkêrê bêkêr. ..

- Bi dengê giramgir:

- Bavo! ez xulam xwe meqehirîne. Ez li hemû dermanfiroê ê Diyarbekirê geriyam, lê peyda nebûn. Ka qey bi destê min e çêkirina demanan?

Cemîlê birayê min rabû pê, ji min pirsî. Min dermanfiroê ku lê geriyabûm yek bi yek jê re gotin. Ez firêqet bûm.

40

Cemîl:

- Keko hý çûy Baxlar (Rezan) û Ofîsê?

Bi êleke ecêbmayî:

- Na ... Çima qey liwê jî dermanfroê hene?

Cemîl bersîva min neda. Ji min reçetê xwest. Min ji nerma

xwe de reçete dayê. Ew û zavayê min rabûn çûn ku herin Baxlar û Ofîsê.

Kêr li min bixistina wê dilopeke xweynê jê nehata. Rast bû, ez bêkêr bûm. Çawa dermanfroêên Baxlar û Ofîsê nehatibûn bîra min. Lê ku Cemîl û Ziya ji wê derê derman peyda bikirana, wê rewêa min a di ber çavê bavê min de çawa biba? .. , Hem nexweê e hem kal e û hem jî bi gazin û lome ye. Heta Bedlîsê, çi heta Bedlîsê belkî heta mirinê ewê viya liriye min xista û bigota: /LT e nikarîbû dermanek bikiriya, hý hê jî dibêjî ez war im?!"

Ez weêeke xweê li cem bavê xwe rûêtim. Ji niêka ve bi daxwaziyeke dijwar dilê min bijiya cixare êandinê. Pismamên min Mîrxan û Keleê libalê bûn. Rabûm, dakiêim salona liqata xwarê.

Li koêekê bi cih bûm. Min çayek xwest. Cindiyê me î T atwanî ber bi çavê min ket. Min destê xwe jê re hejand. Cindî ez dîtîm, ber bi aliyê min ve hat. Ez ji berê rabûm piya:

- Bixêr hatî! Tu û van deran?

- Xêra Xwedê lite be. Wellahî hebek îêê min hebû.

- Xêr be, îêekî çawa?

- Dilê min û çûyina Almanayê heye, ez hatim ji bo pasaport stendî.

- Te pasaport stend?

- Naxêr. Ezê hê nû serî lêxim. Li hêviya Tekîn im; hin sergêjayiyên wî hene, bla jê vala bibe.

41

- Çi peywendiya Tekîn û pasaporlê bi hev re hene?

Cindî di binê simbêlan de bêirî û got:

- Ûsiv beg ma peywendiya Tekîn û çî bi hev tunene ku?  
Niha ku ez rasterast serî li êuhba pasaporlê xîm, heta meh  
an meh û nîvevekê dê biawiqim. Lê bi navgîniya Tekîn, kesî  
nemirî heta roja çaran ewê bi hev keve.

Serê min negihîêt vî karî, vî îêî. Min tiêtek negot, lê di  
maneya serwext nebûnê de min serê xwe hejand. Cindî bi  
aliyê pêrgîngêhê ve serê xwe zivarl û nihêrî. Dû re rabû ser  
xwe û gote min:

- Vî qasî bi destûra te.

- Hêvî dikim ... ser çavan.

Cindî ber bi pêrgîngêhê ve meêiya, li ber pêrgîngêhê ew û  
Cemîlê birayê min û Ziya leqayî hevûdu bûn, pirsar hevûdu  
kirin. Ez jî rabûm. Cemîl û Ziya çav bi min ketin, ber bi  
min ve hatin. Bê axaftin serê xwe bi belengazî, di maneya  
peyda nekirinê de hejandin. Min ji wan pirsî:

-Çawabû?Wepêdanekir?

Cemîl:

- Keko welaM me derman:firoêên BaJar û Ofîsê serûbinê  
hev kirin, lê mixabin me tiştek bi dest nexist.

Em hilki.êîn jorê cem nexweêê xwe. Me nexweêê xwe li hêviya  
Keleê û Mîrxan hiêt ku di saet nehê êvarê de bi otobusê  
herin Bedlîsê. Min sê nusxe fotokopiya reçetê derxistin: Yek  
da Mîrxan, yek da Cemîl, yek da Ziya û eslê wê jî bi min re  
ma. Min tafilê Ziya verêkiri ewê biçûya Erxenî, Elezîz, Bîngol  
û Mûêê. Ku li wan deran jî peyda nebiwa wê heta Wanê  
biçûya. Piêtî verêkirina Ziya em çûn Deriyê Mêrdînê min  
Cemîl jî bi teqsiyê verêkir; Ewê jî biçûya Mêrdînê, Stewrê,  
Midyardê, di ser Kercewsê de biziviriya Batmanê, di ser Biêê-

rî Ê Gurdêlanê de biçûya Sêrlê, ji wê derê jî biçûya Bedlîsê. Siwêrek, Êda, Bîrecûk, Nizîb, Entab û heta Edenê para min diketin.

Gava ez li otobusê siwar bûm tiêtekî gelek xerîb hate bîra min: "Di êerkariya peydakirina dermanan de qumandarê cebha Enteb û Edenê Êsiv Şengalî ... " "Qumandar" û "cebhe" lixweêa min nedihatin. Ez lê fikirîm: Himm ... tamam ev xweê e; "fermandarê eniya rojava" an jî "fermandarê eniya Êda-Entab-Edenê Êsiv Şengalî ... " Lê rutbe? Min rutbê nedît. "General" bêjin çawa ye? himmm ... Pir bilind dikeve ne wisa?

Rastiyeke vê hebû. Di sedsaleyê bîstî de li bajarekî mîna Diyarbekirê ku meriv hin dermanê bijûndariyê peyda neke û sirf ji bo peydakirina dermanan li çar ah, li qesebe û bajaran belav bibe; ku ev êdî "êerkariya di eniya bidestxistina dermanan" nîne, lê çi ye? Ku di damezranên dewletî yên bijûndariyê de di vê sedsaleyê de, ne ku derman ji binî tunebin lê li her derî serûmên mar û dûpêkan qet ji binî tunebin, mirov ji pêvedana mar û dûpêkan bimirin û ew reê di rojnameyan de bi qîreqîr bê nivisandin; navê vê kirina min ku ne "êerkariya di enî ye" lê çi ye?

Roja pênc zivirîm Diyarbekirê lê bi destekî vala û rûyekî reê. Pênc roj; bi êevê û bi rojê pênc roj. Bi otobusê, bi mînbûsê, bi teqsiyê pênc roj ... Li her qesebe û bajarî dikan bi dikan li dermanfiroêan bi gerînê pênc roj... Bi bajarên xopan mîna Siwêreg û Mereêê pênc roj... Bi peydanekirina dermanan pênc roj... Bi bêxewî, bi westiyên û windakirina

meferê pênc roj ...

Li Seyrantepê ji otobusê peya bûm. Westiyan bi serê nikulê bêvila min girtibû û min lipey xwe bi gemirandinê diki-

43

êand. Gevzika kera hate bîra min, çi tiêtekî xerîb e, ne wisa? Lê ez bawer im ku tu kes mîna min a wê gavê bi rûmeta wê gevizînê nizane, kes mîna min a wê qasê bi daxwaziyeke dijwar a gevizînê, gevizînê naxwaze. Ax xwezJa ne ji êerma ji mirovan biwa, min bikariba xwe têr li vê rasta ha bigevizanda da ev jan û sistî ji movikên canê min derketa. Ji niêka ve min xwest tevzîkê bidim xwe Lêtafi.l.êLêwarqJîm ku ez li garajê me û hawirdorê min bi boêahiya mirovan mîna pêlên di deryayê dikele. Ji naçarî min dev ji vê daxwaziya xwe berda. Dengêkî bêngkynnê bi guhê min ve hat, li aliyê denghatinê ve zivirim. Cindî û yekî dinê bûn. Me kêfxweê di hevûdu da. Cindî hevalê xwe bi min da nasîn: Elîêanê Motkî. .. Li Elýêan fetJîm:

- Di min bibûre! Welahî serê min ewqas gêj e û ez jî ewqas westiyame ku ronahî di çavê min de nemaye, ji ber vê min tu nenasî.

Elîêan:

- Hêvî dikim, ev çi gotine. Ma ez te nasnakim qey...
- E bi xêr û xweêhatî. Ji Almaniyayê kengê hatî?
- Welahî çi bigire wayê hefta min diqede.
- Ya?! Bi xêr hatî. Hê nû diçî Bedlîsê an ji Bedlîsê têy?
- Duh ji Bedlîsê hatim. Çawa?
- Xêr bû îneellah?
- WelaM hin mark hebûn, min xwest ku hûr kim; lê çûm

kîjan bankê hûr nekirin. Yê ku got "lîsta bihayê nû hê nehatiye",  
yê ku got "êuhba me likambiyoya biyanî nanihêre".

Her yekî bi awakî got.

- Tejî anîn Diyarbekirê?

- Belê lê ...

Cindî gotin ji berê hJanî:

44

- Dilê Xwedê pê êewitî ku leqayî min hat. Heke na ewê bibira

Merkez bankê, bi erzanî bifirota. Me bir da T ekîn, baê

bû, ji bihayê resmî bi pênc lîra zêdetir me pê da hûrkirin.

- Hela hela ... Tekîn mark pê çi dike?

Cindî leqayî naêtekî hatibû, bi xasûkî biêirî:

- Ohoooo ... o! Ûsiv beg! Tekîn her êt e. Diravên biyanî

dikire û difiroêe. Herwekî ku ez bûm ax û xwelî Merkez

bankê ji deh dolarî zêdetir dravê biyanî neda min. Ez çûm

cem Tekîn min bi heftê hezarî dolar û mark jê kirîn.

- Ha bera pasaporla te çi bû?

- Bi dilgeê biêirî:

- Ku pasaporl neqediya, min dikaribû diravên biyanî bikiriya?

Min rahiêt destê Cindî û Elîêan, xatir ji wan xwest û êiqitîm

bajêr.

Bi tihnbûyineke dijwar bi xwe hisiyam, êar bûm. Rabûm,

bi lezûbez min dest û serçavê xwe êuêtin. Min serûguhê

xwe da hev. Ji odê derketim, peya bûm salonê. Çûm pêrgîngehê,

Tekîn bi zilamekî re bilî bû. Çav bi min ket, bi rûgeê

î:

- Êvarbaê! ez benî.

- Êvarbaê ... Ji bo Bedlîsê minê telefonekê hêvî bikira.



Tek"ýnbi tiliya xwe ya îêaretê ve, got:

- Saniyekê ez benî.

Ji axaftina Tek"ýn, zîlamê ku pê re bilî dibû doktor bû. Mala doktor di tariyê de mabû, ji Tekîn ampûlên elektrîkê dixwest.

Tekîn bi dengekî nizim jê pirsî:

- We çend divên?

45

- Ku gengaz be çar ... Ji kerema xwe re.

Tekîn li zîla hundir ya bangkirina garsonan xist. Garsonek hat, liber pêrgýngehê rawestî:

- Fermo?!

Tekîn Lê zivirî, ji berîka xwe pênc sed ka derxist, dirêjî garson kir:

- Bi lez here çar ampûlan bi 1e pakêt û bîne.

Garson rahiêt diravê kaxizîn kir berîka xwe û di deriyê otêlê yê derveyîn de ji çavan nependî bû, çû. Tekîn li min zivirî:

- Di min bibûre.

- Hêvî di 1im ... Minê telefonê bixwesta, ji Bedlîsê re.

Tekîn numerator gerand:

-Alo! ..

Li salonê derbasî qunci 1eke vala bûm. Garson ewê çav bi min ketibe ku çend rojnameyên rojê anî danî ber min. Dû re bi endaze rahiêt xwelîdanka belûr bir vala kir, piêtî paqij kirinê anî danî ser masê. Bi pîr û pergala hînbûyî ya garsoniyê vekî. Min jê çay xwest. Serê xwe bi giramgirî tewand:

- Sersera ezbenî.

Gonga kathijmêrê ya di salonê bi tingýneke zirav li dehî xist.

Pêre pêre Erdal ket bîra min. Erdal avûkat bû, li Diyarbekirê.  
Hevalê min î fakultê bû. Me ji hevûdu gelek hez di1ir.  
Di nav xortên Diyarbekirî de, ew xortekî gelek hêja bû; sergiran,  
zîrek, bi êipil û di dersan de jî gelek jêhatî. Li cuzdanê  
xwe geriyam, min qertê wî dît; telefona malê tê de nivisandî  
bû. Rabûm çûm ber pêrgýngehê, min numarê da Tekîn ji bo  
lêgerînê. Tekîn li mala wî geriya, mal derket lê Erdal ne li  
malê bû. Pîreka wî li yê ku li Erdal digeriya pirsî. Min navê  
46

xwe û navnêana xwe ya otêlê dayê; gava biziviriya malê bla ji  
kerema xwe re li min bigeriya.

Pejneke xayîn serê xwe di bîra min de pij kir û bi min keniya:

"Heta îro tiêtê ku lê geriyayî te çi ji wan bi dest xist ku  
Erdal bibîyû? Tu herî ber ava Firatê ewê av li te biçike."

Nizanim, ev pejna min rastiyê an nerastiyê digote min.

Lê ji min re wisa dixwiya ku ji zaroktiya xwe û heta îro min  
xwestibe çi tiêtî bi dest xim, ew bi destê min ve nehatiye.  
vêca tiêtên min ên ji aliyê min ve ku hatibûn bidestxistin  
yek bi yek li pêê çavên min, mîna wêneyên di sînemayê de bi  
giranî derbas dibûn û digotin min: "Lê em?" Ew pejna min  
a xayin bersîvê ji ber min kltanî û bi biêirandineke tinazkir  
digote wan: "De siktir bin lo! Ji we bi herkesî re heye, ma  
b.un jî xwe ji ni' metan dibînin 7"

Ez di navbera êerkariya van herdû pejnên dijber de bi saetan  
mam, hatim perçiqandin, hatim gemirandin, hatim gevizandin.

Dengê Tekîn ez filitandim ji vê rewêa ne xweê. T ekîn  
diqîrî:

- Yûsif beg ! Yûsif beg!. .. Telefon.

Bi bazdan çûm.

- Ji ku derê ye? Bedlîs e?

- Na! Erdal beg li te digere.

Min rahiêt ahîzê:

- Alo! Ez Yûsif Şengal. Êvar baê Erdal beg! Çawa yî baê „? 1.

- Spas! Tu û van deran? Tu çawa yî?

-Welahî qet mepirse. Tu zaýû nimara telefona Osman beg û ya Nejat ê me yê eczacî li Îstenbolê, ji min re lazim e. Ku li cem te hebe xêra xwe bidî min.

- Xêr be îneellah ?

47

- Çi xêr ... çi hal... Îro çend roj in ku bavê min ji satilcanê nexweê e. Me ew anî ba Xelîl Îbrahîm beg. Lê ji Edenê heta Wanê tu der û dever neman ku em Lê negeriyên, me derman peyda nekirin. Vêca ezê telefonê Osman beg, Anqerê û yê Nejat beg Îstenbolê bikim, ku heta sibê êvarê peyda bikin, dusibe siwarê bi balafirê herim bînim.

Erdal nimareyên telefonên herdiwan jî dane min, min li cem xwe nivisandin. Min spasî wî kir, dû re ahîzê danî ciyê wê. Min spasî Tekîn jî kir. Tekîn navê dermanan ji min pirsî. Min reçete derxist, ji reçetê navê wan xwendin. Tekîn gote min:

- Niha tu ji bona van dermanan livan derayî, ev çend roj m..?

Bi kovanî min bersîv dayê:

- Belê wele. Ji bona vana livan deran im.

- Çima te ji min re negot?

- Minê ji te re bigota çi?

Tekîn lizîla hundir xist, garsonekî hat. Tekîn gotê:

- Ji min re wiskiyek bi qeêem ji dolabê. Yûsif beg te çawa diveA.?

- Spas bla ya min jî welê be.

Tekîn li garson zivirî:

- Du wiskî bi qeêem. Ji ya skoç. Ehmed li wê be, Ehmed, ku ew ne liwê be, N ecmî biêîne.

Garson çû. Du deqîqe êûn de digel du piyan wiskî û garsonekî ve hatin. Tekîn reçete drêjî garsonê dinê kir:

- Ehmed! Ji kerema xwe re here cem Şêxmûs, êev dora wî ya êevê ye, bla van dermana bide te.

Ehmed serê xwe di meqamê erê de hejand. Tekîn ji berika xwe du hezar lîyra derxist, dirêjî Ehmed kir. Ehmed çû. Gar-

48

sonê dinê piyana wiskiyê dirêjî min kir, min a xwe hilanî, Lê di qirika min de nediçû xwarê. Tekîn piyana xwe bilind kir:

- Haydê ji xweêiyate re, Yûsif beg!

- Ji xweêiyate re ...

Pênc deqîqe êûn de Ehmed tevî dermanan êw dermanên ku di reçetê de nivisandî bûn, tevî wan bi xwe- hat. Ehmed pakêt dirêjî Tekîn kir. Min pakêt vekir, tu têvelý tê tunebûn, ew bi xwe bûn. Ez li Tekîn zivirîm:

- Ev çawa dibe?

- Çawa?! Çi çawa dibe?

- Dermanfiroê di Diyarbekirê de neman ku ez Lênegerîm û min peyda nekirin. Ji bona wan Entab, Edene, Mereê û Meletye ji ber lingê min nefilitîn.

Tekîn gotina min di devê min de hiêt:

- Derman wisa peyda nabin ku. Tu zanî Yûsif beg! Ma avûkatî navgýneke di navbera dozdar û mehkemê de nîn e? Ne wisa? Ê divê navgýnek di navbera dermanfiroê û nexwe-  
êan de jî hebe. Tu rabûyî bi serê xwe çûyî, te reçete dirêjî wan kiriye û gotiye "ev derman hene?" Derman wisa nayên kirîn ...

Bera jî wisa ha ... Ji kerîtî min aqil pê negihand. Ew qas saL, aw qas xwendin bereday çûye. Ji pasaporl derxistinê, ji kirîn û firotana dolar û sterlîn, ji peydakirina ampûlên elektrîkê, ji kirînûfirotana wiskî, marlboro, divê min bizaniya ku derman jî peyda dibin, lê li otêla me. Belkî benzîn û hkîdgaz jî peyda dibe. Ax kero ax! ...

Berdestî sibê li Bedlîsê ji otobusê peya bûm. Çûm malê, deriyê me vekirî li ser piêtê bû. Ewê zû rabûbin. Ez ketim eywanê, çend cîranên me yên nêzîk rûniêtibûn, ku çav bi 49

min ketin giêt rabûn. Min li bavê xwe pirsî, Hacî Beêîr Axa bi dilovanî ez hembêz kirim û gote min: "Bla serê te sax be!" Min bîr pê nebîrê: "Hela hela ev çi dibêje bla serê te sax be." Ez çûm ber nivîna bavê xwe, min êemla wî ji ser çavê wî avêt. Çavê wî vekirîbûn, li min dinihêrîn. Nana. Çavê wî vekiribûn lê nivistî bû, ne hiêar bû. Min ew hejand:

- Bavo! bavo! Min derman peyda kirin. Vayê min anîn.

Di gotina min de tu tiêtekî zîz tunebû, lê hejiyan bi wan ket, giêt bi hev re girîn. Li wan zîvirîm:

- Êra xêr e? Hun ji bona çi digirîn?

Hacî Beêîr axa hat, bi milê min î rastê girt. Ji wî tirê ku

ezê bilêevim. Min dengê xwe dernexist. Bi destekî jî piêta min miz da û pê re gote min:

- Bla serê te û merivê te sax bin, Êsiv, roniya min! Bavê te mir, birayê min.

Ez lê zîvirîm:

- Tu dîn î, jîr î? Tu nabînî ku min jê re derman anîne?

Ka lê binihêre ku çavên wî çawa vekirîne, li hêviya dermanan e. Bavê min nemiriye, çavên wî li hêviya dermanan qerimîne.

Hacî Beêr axa dev ji min bernedida. Bi herdû milên min girt û li nav çavê min nihêrî.

- Êsivê min! Derman bi Xwedê ye lawo, êîfa bi xwedê ye.

Bera rast e? Şîfa bi Xwedê ye? Çima derman bi destê Tekîn e, çima êîfa bi destê Xwedê ye, hiiim? Ku derman ne bi destê Tekîn biwa, wê gavê ewê êîfa bi destê kê biya gelo?

Min ew qas sal xwend jî beredayî bû, hê jî têngihêtim ku

êî:fabî destê kê ye? N emaze êîfa satilcanê, ya bi derman peydakirinê bi destê kê û ya bi derman peydanekirinê bi destê

keA.?

50

Ku hun rastiya wê bizanibin ji kerema xwe re ji min re bi namekê binivisînin. Navnêana min eve: "Xaziyê êerkariya derman peydakirinê lieniya rojava, Êsiv Şeng alî, Bedlîs."

Li hêviya we me, ji bîr mekin.

SI

KAMERIVATÎ MAYE?

Hesenê Xelîl li ber siya danê êvarê qilûzka runiêtî bû,

piêta xwe dabû dîwêr. Şewqa wî li serî, li aliyê çepê

xwarkirî bû, bi destê xwe yê rastê serê xwe dixurand. Neku

serê wî dixu riya an girrê wî rabûbû, kurmê wî ev bû; gava li tiêtekî bilikiri.ya bi tiliya xwe ya gustîrkê ya rastê êewqa xwe li aliyê çepê yek alî fikir û bi wê tiliyê serê xwe dixurand.

Aytanê ji dermalê derket, bi lotik û çindikan ber bi deriyê heêê ve da tirada. Niêka ve gazî kir:

- Bavo! Ho bavo! Aapo! aapo! aapo! apê ê!

Dengê Eliyê Xelîl ji dûrî ve hat:

- Tu sebra apo yî, tu qama apo yî, tu çira apo yî, tu berxika apo yî ...

Eliyê Xelîl bi destê Aytanê girtibû û dihat. Selav li birayê xwe kir. Hesen bi selav vegirtinê re xwe lipijand, xwedê-negiravî ku rabe ser xwe, lê hat bîra wî ku kekê wî ye, tevgera xwe xerab nekir. Lê got:

- Aytêl Madem ji apê xwe wisa pir hez dikî, de here jê re kursîkî bîne.

Dû re li Elî zivirî, gotê:

- Erd hênik e, tu li erdê runanêy?

Elî li erdê çolemêrgî ruêt, pala xwe da dîwêr.

Qasekî vir de wir de ji alûbalê dinya gewrik axilin. Di vê navê de Perîeanê hat pirsî tiyê xwe kir, qasekî li ba wan runiê t û dû re rabû çû.

Elî gote birayê xwe:

52

- De wele êvar e, destê min ji te nabe, bi destûra te be ezê rabim.

- Tu zanî.

- Heta ez bigihîjim malê, wê melê evarê bixweyine.

- Lê! lê! ancax.

Elî bi qilqilandin belegoêka xwe xurand û li Hesên zivirî:

- Hesên bira! Wele em ji ber destê miêkan di helakê de çûn. Me dafikê danî ber wan, nebû. Min dermanên wan kirî anî, nebû. Îca min bihîst ku têtjika pisîka we heye û ji we zêde ye. We têtjika pisîka xwe bida me hunê çiqas pê xwedanxêr bibûna.

- Têtjika pisîka çi?

- Têtjika pisîka we... têtjika pisîka we lo!

- Niha tu ji bona têtjika pisîkê ewqas rê hatî?

- Wele Xwedê gotiye "qûlo rast bêje!" Min got hem ezê werim pirsê we bikim hem jî bi we ewê bihna min derê û di vê navê de jî ezê ji we têtjika pisîkê bixwazim. Ku we da mala we ava, ku we neda dîsa jî mala we ava.

Hesên:

- De xwezila keko te ez kuêtibûma ji vî halî çêtir bû. De mala min di oxira te de ye; dixwazî niha agir berdê. Dixwazî Osmên tayê bitenê serjêke, ku ez bêjim "çima te wisa kir?" ne eferim ji min re. Canê min, ruhê min, zarûkên min giêt di oxira te de ne. Lêbelê ez hêvî dikim, tu daxwaziya pisîkê û têtjika pisîkê lime nekî.

- Malneêewitiyo serî binî têtjika pisîkê ye lo!

Hesên:

- Ne tu nizanî ku ev pisîk û têtjika wê di dilê me de çiqas êrîn in? Ma te got qey bera pisîk in? Na wele ... Sebra me ne.

53

Eliyê Xelîl bala xwe dayê, çi bêje tewê e. Tirsiya ku paêiyê wê bibe cîrnexweê, awirekî bi keser da Hesênê birayê xwe î ji



dê û ji bavê û gotê:

- Hey! ... hey felekê! Xatirê merivatiyê bi qasî rûmeta têjika pisîkekê jî nemaye. Ha ... ho! ha ... ho! Merivatî, tu bi ku derê ve çûy?

Cemaeta îêayê belav bûbû. Mele Cemîl û Hesenê Xelîl li paêiya giêtan mabûn. Mele Cemîl melê mizgeftê bû, Hesenê Xelîl jî ehlê sun-net û cemaet bû. Hesenê Xelîl ji Mele Cemîl pirsî:

- Seyda te wî karê xwe çawa kir; bi hev xist, bi hev nexist?

Mele Cemîl bi keser bersîv dayê:

- Na wele Hesena. Ka kî bîst hezar dide meriv?

- Te ji Şêx Sedredîn nexwest?

- Min ji Şêx Sedredîn jî xwest, min ji Hacî Tahir jî xwest, bereday bû.

- Mele Cemîl! ji mintirê malbata we giêt di ber benê mala wan de bûn. Hun dostên hev ên kevin bûn jî, divê ku hewcedariya te biqedanda.

Mele Cemîl serê xwe pêl kir, kulên wî ji nû ve axibî bûn.

Tu bersîvek nedayê.

Hesenê Xelîl dîsa, lêbelê pirseke dinê pisî:

- Ji mintirê kirîvatîke di navbera we û mala Hacî Tahir de hebû. Divê wî biqedanda.

- Lê niha wê çawa be? Ji bo bîst hezarî ew masûm, ewê di hebsê de bimîne?

Mele Cemîl axîn rahiêt û bi keser got:

- Ka merivatî maye? Ka însaniyetî? Ka îslamiyetî? Ka

54

wijdan û reb û êefaquet? Ka merivan ka Heseno?

Hesenê Xelîl di nav destên xwe de tesbîha xwe ya selewatan miz da û givaêt, di ber xwe de got:

- Belê wele ne merivatî maye, ne reb û êefaquet... Kes êdî karê kesî naqedîne. Lê, me digot belkî li ba we alim, êêx û hecacan mabe.

Mele Cemîl rabû ser xwe; lembeyên mizgeftê vemartin. Ji bîr rakiribû ku cubê xwe derxe, li ber derî lê warqih, lê di xwe re nedît ku bizivire. Deriyê mizgeftê bi kilîtê rada, kilît kir berîka xwe. Çend pê avêtin, di tariyê de reêahiya merivekî di wan de derket; selav li wan kir. Mele selav vegirt. Mêrik got:

- Seydayê Mele Cerûj ez hatime pey te: Sofî Sebrî miriye, xêra xwe tu bihatayî û ew biêûêta.

Mele Cemîl herwekî timî got:

- Înalillah we îinne îleyhî racî'ûn. Kîjan Sofî Sebrî ye?

Mêrik:

- Nêzecîranê me ye. Kesî wî tune. Derûcîran xêra xwe lê dînihêrtin.

- Ya? Wax mala minê! Xwedê kesê kesan e. Xwedê bi rehim û kerema xwe êa ke. Bla hun sax bin. Dûrî we be îro çend roj e, ez hema wisa bêkêf im; nikarim xwe li ser piyan bigirim. Heke ne nexweê bama ezê bihatima, lê çawa! Ma însaniyetî û îslamiyetî nemaye!? De Xwedê xêra we mezin bike, divê ez herim malê bikevim nav nivîna.

Bi gotina xwe re jî Mele Cemîl hêdî hêdî dinaliya. Mêrik bi lavayî gotê:

- Seyda destê te radimîsim, ji êvara Xwedê de tu derek nema ku em neçûnê. Me tu mele neqefalt. Yên ku karê wan hebûn, yê ku nexweê bûn ... Vêca min tu qefaltî, bla xêra

te be, divê tu werî.

55

Mele Cemîl zor da nalînê û bi nalenal:

- Birayê bavê min! ne hewce ye ku tu xêra min bi bîra min bû. Ez mele me, ne cahil im. Ma ez nizanim ku xêr çi ye, çi rûne? Ez ji te re dibêjim ku nexweê im. Tu wisa dikî ku êdî ji xêrê dertê. Xêra min jî diçe, ya te jî. Ji êvara Xwedê de ew qas te xêr kir û niha te giê bi avê re berda. Tu ne gune yî, çima lixwe wisa dikî?

Mêrik li riya xwe zivirî. Mele Cemîl û Hesênê Xelîl ber bi malên xwe ve kudandin.

Mele Cemîl deriyê hewêê bi kilîta xwe vekir, ket hewêê. Bi çingîna çengelê derî re perdeya paca oda rûniêinê li yek alî vebû, jina wî di piêt camê de mêrê xwe fesiland; rabû hat eywanê pêêiyê, bi xeyd gotê:

- Êra tu li ku derê mayî? Ji êvara Xwedê de Hacî Qasim axa di ber sekeratê de ye, bi ser de dixweyînin; tu jî çûyî ketî mizgeftê. Tu bi qup ketî?

- Te çima zûtir haya min pê nexist?

- De haydê zû! Siûda te hebe tê zû bigihîjîyê.

Mele Cemîl zû zû cuba xwe derxist avêt ser loda êzinga, bi êipil, bi êipilahiya xortekî çardehsalî li riya mala Hacî Qasim axa havilkar bû.

Hacî Qasim axa dewlemendekî ji dewlementirînên vê qesebê bû. Xwediyê heft gundan bû.

"Ewê îsqata axê çi qas be? Nizanim ewê wî teslîmê êvara Înê bikin an jî nekin. Ku teslîm bikirina wê perekî hêja jê bihata. Lê ez zanim ku niha cemaeta Mele Nûrî wekî sîsyarekan

li dorê hêwirîne, bergehê ji kesî re nahêlin. Bi rastî meletî û navê meletiyê herimandine. Meriv ew qas jî yekcar çavbirçî nabe lo! Ê ku ew dikin êdî ne meletî ye, mirtibî

56

ye... hetekî ye. Avûrû ji misilmanan re nehiêtine. Rizqê feqîr û fiqaran birîne. Yekî wekî min ka ewê bi meaêê rût çawa îdara xwe bike. Zor e, zehmet e. Ne însaniyetî maye ne îslamiyetî ... Ne merivatî maye ... Ne dostanî û xatir ... " Wisa difikiri û di serê xwe de diaxili Mele Cemîl. Hat serê kolana mezin a nav çarêiyê, çavên wî bi Doktor Selîm û Avûkat Cembelî ketin. Bi sê çar gavan li pêêiya wî dimeêyan. Ji bo ku nekeve pêêiya wan - bê edebî neke - gavê xwe sist kir. Ji xwe re got: " Herhal diçin qulûbê."

Doktor Selîm hûrik hûrik digote Avûkat Cembelî: " Rast e, jînik bi derba qebza debançê miriye. Yuzbaê Kemal bi xwe bi qebza debança xwe ji paê ve li serê wê xistiye û jînik pê, di hundir de bi windakirina xwînê, miriye. Xwedê zane ez gelek jî berketim. Ev hovîtî ye, ev xwînxwari ye. Ev ne însaniyetî ye. Lê çi heye ku jînik êdî miriye û paê ve nayê. Erê emê bêjin bla Yuzbaê Kemal here cezayê xwe bikiêne, lê çi gunehên jina wî û herdû zarûkên wî hene?" Avûkat Cembelî gotina wî bi pirsekê biri:

- Doktor! Dibêjin ku Kemal lite gef xwariye?

Doktor silikî, bi dengê ne zelal bersîv da:

- Nizanim kî van tiêtan ji berê xwe ve çêdike? Ne rast e.

Yê ku min kir ne ji tirsê, ne jî ji gefê bû. Însaniyetî... Ma merivatî, însaniyetî nemaye?!... Raporek e, tê du xetan xêz bikî pê malek difilite diçe. Tu nizanî, gava êekil û sûretên

zarûkên wî serseriyê Kemal dihatin ber çavên min, bê ez çawa dibûm? A însaniyetê eve, Cembelî! Însaniyetê eve.

Avûkat Cembelî di ber xwe de lê ziviri:

- Rast e, te wezîfeya xwe ya însanî kiriye. Lê dibêjin ku pênc-êêê zarûk ji wê jinika kuêtî sêwî mane. Lê tê çi bikî? Qeder û kuçiksaniya xelkê me eve. Bi daxwaziya du-sê •

57

"dewrimcî"yê IIÛna min Û te naguhire. Ji xwe ne meriv in û naxwazin bibin meriv jî. Wê salê di hilbijartinê de çiqas ray dan min?!

Mele Cemîl li xwe geriya, destê xwe avêt berîka êalwarê xwe ya aliyê rastê, tesbîha xwe derxist. Pêêiyê xwest ku wîrdan bikiêne, çend caran sihêtiya xwe kir jî: "Subhanellah welhemdûlillah wellahûekber", lê gotinên doktor ji hiêê wî nedîçûn. Ne ji hemdê xwe digot: "Însaniyetê ... merivatî ... ", lêbelê lê venebû. Zmanê wî ji berê xwe ve digot: " Însaniyet î? îslamiyet î? merivat î?"

Ji paê ve dengê hate ber guhê wî. Bala xwe dayê, belê dengê yekî bû gazî dikirê. Zivirî dît ku Mistê Smaîl e. Ber bi hevdû ve çûn, bi destê hevûdu girtin, pirsê hevûdu kirin.

Mele Cemîl gotê:

- Tu zanî? Dibêjin Hacî Qasim axa di meêeta Xwedê de ye, ez bi wê ve diçim. Te dî hem wezîfa însanî ye hem jî ya îslamî ye û hem jî dostaniyek me hebû.

Mistê:

- E baê e, ji xwe ez jî bi wî aliyê ve diçûm.

- Mistê! ka te daweta kurê xwe nekir?

- Na wele. Lê bi xêr bi çendekî êûn de emê bikin.

- Çima ew qas bi derengî ma?
- Mele, perê me hevûdu dernexist. Mala te û ya camêr ava îro Şêx Sedredîn heêtê hezar da me, emê deynê xwe yê qelen pê biqedînin û bûka xwe bînin.

Mele Cemîl wekî ku li hev deliya be:

- Dengê te nehat min, te got kê karê min qedand?
- Şêx Sedredîn. Şêx Sedredînê Şêx Muhyedîn.
- Bi çi qewlî?
- Li ser genim. Di gerewa çar sed olçek genim de; olçek bi

58

du sedî.

- Çi?.. Îsal ku çû olçek bi pênc sed û pêncî, bi êêê sedî bû.
- Ê ew perê hazir û genimê hazir bû. Ev, perê hazir û li ser hev û genimê ne hazir e. Dîsa camêr ji bona xatirê merivatî û însaniyetiyê da. Mesrefa kiêandinê jî li min. Mala te û camêr ava be lo! Wî em ji tengasiyê filitandin, bes e. Merivatî û însaniyetî eve, ewqas! Ne wisa Mele Cemîl?

Mele Cemîl li halê xwe fikirî, hê duh bû ku çûbû xwe avêtibû Şêx Sedredîn. Şêx bi ûcaxa xwe sond xwaribû ku, ne bîst hezar lê niha gumana wî di hezarê bi tenê de jî nedîçû. Ji xwe heta sê rojan divê panzdeh hezar rayke da ku bonoyê xwe bide. Hey! heyla gidiyê teresa dinyayê!

Mele Cemîl û Mistê SmaJ li ber serê kuça Kaniya Biyê ji hevûdu veqetiyên. Di xatir xwestinê de devê Mele Cemîl lê nedigeriya. Mistê Smaîl wekî hemberekî jê re dixuya. Bilqînekê ji kevçîka dilê wî hjkêiya hat heta gewriyê, di gewriyê de herbilî; ji zerpan kuxiya, ji ber kux"ynê dilop eke hêstirk gêr

bû, lê, li xêzika bin çav artili, ma. Bi gurçika destê xwe yê rastê çavê xwe paqij kir. Ji kezeba kûr eêheda xwe anî, pê re qefesa sînga wi hilrabû, piêên wî mîna nixafekê lihewa hêmî ya berdestî vê biharê mijiya. Dîsa dest bi wird kêandinê kir. Lê xem û xeyalên wî nedihîetin ku bêje "subhanallah, welhemdûlîllah, ellahûekber." Mêjîyê wî, fikra wî her pê "însaniyetî, îslamiyetî, merivatî"yê didan niqirandin. Çirûskek ji serê wî hilfînyaya, mîna babelîskê; pêêiyê pehn bû, dû re lihevûdu leHya û bilind bû, paêiyê mîna dara gûzeke kevnare ya bi sîwanî û êax û gulî û pelên xwe li esmên pehn kir. Dar li pêêiya wî bû û ew her ber bi wê ve diçû, di her pêgavê de nêzîktir dibû. Ji tenga darê, ji nedîtî ve dengê dihatê: "Mena-

59

aaH' ûûû! menaaaH' ûûû! menaaa&' ûûû! ... " Seydayê Mele Cemîl fikirî, ev çî mu'cîze bû?! Xwedê heqîqetê pê dida nî-êandan. Belê, însaniyetî, îslamiyetî û merivatî bi ava "menan(" A"u hAeêAýn du.1mA, geê a1w.1 uA. BeLAe me nf eet ... me nf eet ... menfeet.

.. Dar çî bigire êdî bi qasî çar-pênc metreya li ber wî bû. Êdî digihîê heqîqetê. Dengê dawidî ji xeybê ve hat: "La hewlawela quwete î..." T a&lê qîrîneke bi îmanî ji nav serê Mele Cemîl çû, got: Sedeq amentûbîllah! Se ... " Dengê wî hat birîn. Sebriyê Kerro:

- O! Mele Cemîl, ev tu yî?
- Sebrî! Tu û van deran?
- Malava! Mala min vayê li vê jêrê ye. Tu bi ku ve diçî?
- Wele gotin ku Hacî Qasim axa di ber sekeratê de ye, min got de îslamî ye, ez herim, em xwe bi hevûdu bidin helal

kirin.

- Hewar xêre, elhemdûlillah! Bi mexrebê re ew birin Diyarbekirê.

Ku doktor ji heq demeyên, belkî sibê bi teyarê bibin

Anqerê. Lê belê Eliyê xeW di ber mirinê de ye.

- Eliyê Xelîl kîjan?

- Eliyê Xelîl, lo! Birayê Hesenê Xelîl ê cîranê te.

- Ya? Mala minê, guno! guno! Çi hewalê wîye?

Sebriyê Kerro axînekê rahiêt. Ewê dest bi axaftinê bikira

ku lawikekî deh diwanzdeh sah nêzîkî wan bû:

- Xalo! Xwedê ji we razî be, we li van deran kurikekî

çar-pênc sah nedîtiye?

- Na! bavê xalo.

Lawik ji wan veqetiya û di nîvetariyê de gazî kir, dengê wî

digizgizî:

- Menafo!. .. Menafo!. .. Menafo!. ..

Sebriyê Kerro dewam kir:

60

- Ha?! Minê viya bigota, Mele Cemîl! Xwedê bi rehmma

xwe bi me re bike. Çiqas dilê min bi Elî êewitî. Ji pesnan xeber

dida. Misêwa digot:"Birao! brao! birao ho birao! miêkan

em xwarin. Te pisîk anî? De were birao, tevî pisîka xwe ve

Ni I h' A S b' "T d' l

were. a. na. un JI gune ne... e ýra we ye... u lO Ae' AJI

xenîmê xwe didît, ne wisa?

Mele Cemîl fikirî, serê xwe hejand, got:

- Alimê xeybê îlellah.

Xatir ji hevûdu xwestin. Sebriyê Kerro tafilê di tariyê de

nependî bû. Mele Cemîl li pêêiya xwe nihêrt, elektrîkên taxa



jêrîn vêketî bûn. Li pey xwe zivirî nihêrt, kuçeya ku tê de hatibû; tarî, êevereêbû. Li oxira xwe meêiya. Vê kuçeya ku serberjêrî taxa jêrîn dibû, teng bû û herdû milên wê bi darên hewran neqiêandî bû. Jê, li ronahiyê nihêrtin; giraniya ji xewna êiyarkirinê didayê. Di ber xwe de got: "Er-rizqû 'elellah!" û ber bi mala Eliyê XeW ve kudand. Di ronahiyê de mîna pîneyeke reêahiyê dûr bû, piçûk bû, ji çavan nependî bû.

61

HECÎ MIHEMED ELIYÊ QELŞO

(Radiyahû teala enhû)

"-Lê çawa, malava! Qey xortê niha jî bera xort in. Ferz e ew wisa dibêjin. Xortanî xortaniya heyama me bû.

Ez xortekî sivik î hê çardeh salî bûm. Ji efendiyê xwe re bêjim, min hê nû dil girtiye, bengî me, dûman ji nav serê min dikiêe. Eyêê, de Xwedê jê razî be, keçikeke wisa delal û xweêik e ku winda bibe temamê keç û bûkê vê ebra me di mizgîna wê de dernakevin. Lê qîza kerê rû nade min. Tew li siya min jî nanihêre. Ez tînim har bibim. Çawa ez ku ez bim, Mihemed Eliyo bim û dilê xwe bikimê û vê kafirbava ha xwar nebe û li siya min nanihêre? . . . Ev efendiyên ha cahil in pê nizanin, Melê min î delal! Lê te ji bavûkalan bihîstiye. Zemanê me, wekî vî zemanî ne berdîberdan bû: Eyb û êerm hebû, fedî hebû, hîcab hebû. Êh ... min jî ji kal û rûsîpiya, ji der û cîranan êerm e. Lê di nav dilê xwe de diqaqijim. Çi bikim çi nekim? A ku min nedî, wele rabûm ji bona sosreta giran min porê xwe berda. Porê min dirêj bû, bû kezî. Du keziyên dirêj, ha bi qasî zendikê min stûr ji paê re

dihatin li binê qorika min diketin. Mêr, jin, kal, pîr digotin:  
'Mihemed Eliyo lawo ev çi hal e li te qewimiye? Te em hetikandin,  
bes e, êerm e êdî porê xwe jêke. Tu zilam î, porê xwe  
wek yê zilaman bike.' Min serê xwe dihejand û di ber xwe de  
dibiêrîm, guh nedida wan û diçûm.

"Bihar e... Hê gundî giêt di hundiran de radizên, derneketine  
ser xaniyan, lê ji kerb û wehcan tebata min nayê; ji

62

bona hema sirf bîhna wê qîza kerê were min derdikevim li  
serbanê xanî radizêm. Xwedê tu ew Xweda yî Lê gavê tu ne  
ew gav î: Şevêkê, du parê êevê çiyê parek maye; carek bi  
deng û hêwirza gundiyan bi xwe êiyar bûm. Min guhê xwe  
dayê ku ji newala jêrin a biniya gund deng û qîjîn û helahela  
gundiyan tê. Min ji xwe re got: Hela ... hela ... Xwedê xêr  
ke, ev hinek avêtin ser gund talan kirin, ev çi bû? Wele hedin  
bi min neket hema sivik rabûm û min xwe di xaniyê du  
tebeqî de xwe avêt xwarê û li êlama gundiyan, ber bi aliyê  
newalê bi bazdan çûm. Hê min riya xwe bi nîvî nekiribû ,  
elhemdûlîlah hewar xêr bû, gundî zivirîn, em rastî hev hatin.  
Lê çi? Kî rastî min dibe kenek pê digire, dikene û dibêje  
"hela bala xwe bidinê, hela lê binêrin!" Hingî ez dibêjim 'kuro  
lawo çi biye, hun çima dikenin?' Ew bêtir bi min dikenin.  
Êh ... damara hêrsê jî damareke pîs e, Melê min. Wele  
ez hatim hêrsê, min çavê xwe girt û devê xwe vekir ku tu  
avahiyek ji wan re nehêlim, rusipîkî hema destê xwe danî ser  
devê min û gote min: 'Mihemed Elî, berxikê min, çika li ser  
milê xwe bizivire û binêre!' Ez li ser milê xwe paê zivirim  
û min bala xwe dayê; wey la malikê tu xera nebî! bangeranê

(lox) qiraseyê giran ê ser xaniyê me, bi herdû keziyên min ve li ser piêta min hiêk negirêdayî ye? .. Ez di ber xwe de biêirim, himmm! Welalýnê Xwedê ev, hunerê wê qîza kerê yê Eyêê ye. Gundî hatin ku vekin ji ser piêta min deynin, min got: 'Na! Li ber destê Xwedê ehd û wehd be, ev fêhlên wê qîza kerê ne, wê çawa bi wan destê xwe yên nazik hatiye bi keziyên min ve girêdaye, herwisa jî hetanî ku ew neyê dîsa bi wan destê nazik veneke, ewê ev bangeran a wisa li ser piêta min bi van keziyan ve girêdayî bi..n1ýne. '

"Lê ... Melê min î delal! Di zemanê me de xort hebûn,

63

hikmê xorta hebû. Dûrî ji civatê xortê niha jî ji xwe re dibêjin

• em xort in û me xortanî dît ., te got qey bera ew jî xort m. . "

Hecî Mihemed Eliyê Qelêo (radiyellahû teala enhû) vê serpêhatiya xwe ji me re di civata li dikana Mele Mehmûd de digot.

Rojekî ji rojên Payiza pêîn a ý966 an bû. Piêtî ji xwendegehê derketinê, me senkî li qehwexanê xistibû, di pey de ez û Fikrî Xoce hatibûn aliyê çaqiya jêrîn. Bawer dikim jê re tiêtekî kirînê lazim bû. Lê li ber dikana Mele Sacid -ku Mele Mehmûd li nik dixebitî- Mele Mehmûd em vexwendin.: "- Mal avano! Ma dilê we di ber çaya me re nayê. Welleh hema ji min tirê keratî be jî ji bûna xatir divê hun min neêik" . enm. tl

Mele Mehmûd hevalekî me yî hem dilovan û hem jî dilzîz bû. Ji bona neêikandina dilê wî em derbasî hundirê dikanê bûn. Em hê baê bi cih bûbûn-nebûbûn Mele Sacid jî hat.

Piêtî bi cî kirina me, Mele Mehmûd derketibû ber derî û camêrekî dinê jî bi wî zarêrînî û karoziya xwe anîbû hundir û bi me dabû nasîn. Ew camêr -hîmet û bereket hazir beew zat bû: Hecî Mihemed Eliyê Qelêo.

Di pey kêfxweêdayina hevûdu, Mele Mehmûd; bi awakî taybetî ya xwe, gotinê anîbû ser bikêrî an bêkêriya xortên îroyîn û ji cenabê wî halê xortên zemanê xortaniya wî pirsî bû. Li ser xwestina Mele Mehmûd Hecî Mihemed Elî dest pê kiribû û vê serbûriya xwe ji me re gotibû.

Piêtî ku Hecî serpehatiya xwe qedand, Mele Mehmûd got:

- Maêelah û subhan ji Xwedê re. Ew bangeranê qirase yê 64

giran ku meriv pê xanî digêrîne li ser piêta te û bi keziyên te ve girêdayî, bi wî halî te ji serbanê xanî xwe avêt û heta newalê bazdayî çûy, gelo qet pê nehisiyayî ku wayê giraniyek li ser piêta te ye, ya jî giraniyek bi serê te ve daleqandî ye? Te qet têdemexist ?

Hecî biêirî û got:

- Camêr tu merivên berê û yên niha dikî yek? Xortên zemanê me bi êipil bûn, jêhatî bûn, bi destekî bangeran radikirin.

Yên niha sistopisto ne, zilhimokî ne. Serê sibê hetanî evarê di kuçe û poxangê qesebê de wek hevîrê tirê bi hev de tirê dibin. Di wextê me de ref û nêçîr hebû, kevirê qewetê hebû, topenanê hebû ... Ka tebatî bi me diket?

Fikrî xoce bi teqilandin jê pirsî:

- Nêçîrvanekî çawa bûy Hecî?

Hecî pirsî wi licî nehiêt. Bêê dudiliyek bike bersîv da:

- Elî axa - ev Elî axayê me- nêçîrvanekî bêhempa bû, di wextê xwe de. Em jî gundiyê wî bûn. Hema wextê ku nêçîr hebiya ewê ji bajêr bihata, tevî gundiyê ku bi nêçîrê emel dikirin biçûna nêçîrê. Êh ... qoce Elî axa ye... Mêrikê mezin e, bi tena serê xwe diçe derekê? Himin ewê pê re ji maqûl û hakimî çend kes hebin. Dîsa bi wî awayî carekê hat gund. Bi xwe re jî uzbaê û çend mamûr û efendî anîne. Êvarê li dîwanê gote me: " Karûbarê me bikin emê sibê herin nêçîrê. " Wele serê sibê ji wî serî de ez jî rabûm, min hespê xwe hazir kir û çûm ber deriyê koêkê. Elî axa û mêvan jî rabûbûn. Piêtî ku xurîniya xwe kirin, nêçîrvan bi rê ketin. Êh. .. nêçîrvan jî bera nêçîrvan bûn; bi tifýngên desta herî baê, bi dûrebîn... Xulam tajî berdî û em ketin rê. Ez jî dûredûr lipey wan im. Te dî eyb e ku meriv êerefa mezin û maqûlan û nexasim a mêvanên wisa biêkêne. Wele ji serê 65

siba Xwedê heta piêtî esira dereng Elî axa û mêvan û qewta nêçîrvanan; ha ew newal li min ha ew gaz li te, ha ev mit li min ha ev mesîlli te bi gera li pey nêçîrê efter bûn, betilîn. Betilînê jî li wê derê bihêle, li ber XV{ejî dikevin. Ewçend nêçîrvanên bi navûdeng ku bê nêçîr bizivirin ser kevaniyan, de dûrî ji Axê rûreê ye, rûreêiya giran e. Êh ... çî bikin? Rebena sihêtiya xwe kirin. Wele tam qewlê xwe dan ku bizivirin gund bi siwarî kiêiyam pêê û çûm li ber Elî axa sekinim, min patekî dayê û got: "Ez xulam we dora xwe kir, vêca dora min e. Bi Rebê izetê kim herçî bê nêçîr em îêev nezivirîn bi ser kevaniyan de. " Elî axa gote min: 'Kuro lawo te ne tîfing e, ne çek û sîlahekî ye, tu yê bi çî nêçîr bikî?' Min gotê:

"Ez xulamê haziran im, Mihemed Eliyê delûdîn im. Ev karê min e, îêê we pê neketiye." a wele min berê serê hespê xwe li ba xist û da xarê. Di destê min de êivekî heye ku serî digihîje erdê. Wele min êiva xwe rakir û geh li rastê geh li çepê, geh li vê tûmikê geh li wê kemê dixim, bi her daweêandina êiva min re ya cotekî kew hema dibêjin pirr bi hewa dikevin û dikevin erdê ya jî kîroêkekî hildipetike û li ser piêtê dikeve. Ku tajî pejnê hilanîn dane dû min û nêçîrvan jî dan pey tajiyan. Wele di nava bîskeke de êdî xurcên serpiêtê hespên siwaran ji nêçîra min a ji kew û kîroêk û rawiran nehat hilanîn. Êdî min got: "Axa! ji min ew ças, êdî îro ew çend bes e." Wele em zivirîn gund, zariyan ew êev kêfa gurê pîr kirin."

Çima ya jî çawa bû nizanim, Mele Hadî hat ber dikanê selav li me kir, me pirsas hevûdu kir. Di pey de ji me re got:

- Çi ye we guhê xwe daye vî Qelêo î kûra vira, ji we re çî vî•reA d'ml e?.

Min ji Mele Hadî hez dikir, lê bi rastî ez ji vê gotina

66

wî aciz bûm û min gotê:

- Haêa ew çî behs e? Em ji xwe re suhbet dikin.

Mele Hadî zivirî çû dikana xwe. Hecî Mihemed Elî di ber xwe de got: "Ji periya welî, ji weliya xwelî. Heyf e ku ji yekî mîna Seydayê Mele Huseyn bê îqadekî wekî viya ma."

Wekî ku masî bi serê nîka masîvanî girtibe, herwisa firseta gotinê ket destê Mele Mehmûd, li me çav kir û jê re got:

- Bi Xwedê kî apê Hecî Mihemed Elî, te dî te û rehmetiyê Seydayê Mele Huseyn we bi hev re hevaltî kiriye. Heta dibêjin

ku we bi hev re li êerê Qorayê dîtine.

Serî di ber de, Hecî Mihemed Elî li Mele Mehmûd vegerand:

- Ji xwe wayê pê dizanî, êdî ez çî bêjim. Wayê bisilman pê dizanin, Mele!

- Çî êik? Xwedê jê razî. Lê ev efendiyên ha - Mele Mehmûd min, Ethem û Fikrî xoce nîêanî wî da - pê nizanin. Ku tu li ba wan jî bêjî, hêvî Xwedê belbî îmana wan jî xurt bibe, îqada wan bikeve cî. Tê jî pê xwedanxêr bibî.

Xwedê-jê-razî dilê Mele Mehmûd nehiêt serpêhatiya xwe ji me re got:

- Şer bû, êerê bisilmanan û qoce kafýn bû. Zivistan e, sar e, serma ye, gêdûk e: Eskerên bisilman lýynî sermaya wisa êedîd nebûne; qalind li xwe dikin nikarin bilibitin, tenik li xwe dikin dikarin bilibitin, lê vêca ji sermayê diqefilin. Eskerê wî kaHrî tenik li xwe dike, lê di ber de jî araq vedixwe pê germ dibe. Êh ... ewê eskerê me çawa bi wî kafýn re êer bike.? Fîzar-fuara wan eý meazelah! Wele ez bûm, bet bereket hazir be Seydayê Mele Huseyn û Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî bûn, Şêx Evdilqadirê Gêlanî, Şahê Nexêebend, Hezretî Elî, Hemze Pêlewan û li ber cemala navê wî

67

selewat Hezretî Mihemed, wele hema me da pêêiya zariyan, êûr kêand û êrîêê bir ser wî kafirî. Her carê ku em li milê rastê êûrê xwe dadiweêînîn bi êlama Xwedê êûrên me çJ carî dirêj dibin û pê re çJ serî wek kulî dikevin erdê, vêca em li çepê dadiweêînin dîsa êûrên me çJ carî lixwe dirêj dibin û pê re çJ serî dikevin

Yekî jê re got:

- Ev yekcar çi bû? Çawa bû. Qey destê wan bi doxîna diya wan ve bû ku liber we dest ranedikirin?

Mele Sacid nihiçik di teniêtê de lê da û got:

- Hecî efendî û kesên dinê xeybane bûn qey ji kafiran ve dihatin xuyankirin Xwedê-jê-razî.

Hecî serê xwe hejand:

- Lê .. .lê ... Lê çawa. Ji xwe eskerê kafir ji eskerê me re digot:

"Wele hun ne êtekî ne, lêbelê ji nav we carina refek kevok radibin û bi ser me de tîn, ew in ku qira me tînin.

Mele Sacid jê pirsî:

- Êh baê e, Hecî efendî, ev qet çek û sîleh, top û tilingên wî kafîr tunebûn? Ev qet derba wan liwe nediketin?

Hecî bi destê rastê riyê xwe yê ênboz î pîroz mizda û biêirî.

- Çawa tunebûn ? Wele wek taviya teyrokê berikê top û mitralyozê wî kafîr dihatin me. Dihatin me lê çawa? Li me diketin, di çê me de derbas dibûn diketin hundir, di navbera tazî û kirasê me de diman.

Yeki jê pirsî:

- Hun pê brîndar nedibûn?

Wisa xuya bû ku djê vî zatê muhterem bi nezaniya me di-êewitî. Serê xwe bi bêirîneke nerm ve hejand û got:

- Himm? .. Brîndar bûyin? Ciyê berikên top û mîtralyo-

68

zên wî kafîrî di canê me de dibûn wek pelqik. Piêtî rojekê du rojan ji berê xwe ve winda dibûn. Lê yê dijwar ne top û mîtralyoz ên wî kaM bû, serma û seqem bû. A di wî êerî de rehmetiyê Seydayê Mele Yehya yê Ferhendî serma girt, piêtî ji êer vedigere gazî jina xwe dike. Dibêje: "Keçê ka were çend



hecama bavêje navmilê min. "Jina wî ya xafil dibêjê: "- Êra li te xêr e, hecamê çi lo ? Tu ji malê demeketî, ji ber tilikê neçûyî ber sefikê jî, te di ku de serma girt? Tu ji pesna xeber didî?" Mele Yehya lê îsrar dike. Jinik tê ku hecama lêxe. Çawa destê xwe davêje ku kirasê wî derxe, bi carekê xuêîn bi berikên di navbera kiras û canê wî de dikevin û dirijin erdê. Jinik ku çav bi van berik û çav bi wan pelqikên li ser canê mêrê xwe dikeve, hew xwe radigire, hema ji nav serê xwe dike qîrîn û dibêjê" ber cemala Mihemed pêxember selewat! Keça min lawo were li hikm û kerametên bavê xwe binihêre." Ji ber vê xafiliya jina xwe ku kerametên wî lê aêkere bûn Seydayê Mele Yehya negihête serê sibê, çû rehmata Xwedê."

Ethem jê pirsî:

- Çima qey jina wî nizanibû ku mêrê wê çiyê êerê Qorayê?

Hecî Mihemed Elî lê nihêrî û got:

- Xwedê xêr pê kiro, qey karê qenc û weliyan karê zaroka ye? Tu dinihêrî li vê derê bi canûcesedê xwe li ba te ye, lê ew bi kerametê xwe li koêekî dinyayê li derekî dinê ye; ya gemîkî xerq dibe, wê xelas dike, ya tofan rabiye çiyê destê xwe dide berê, ya agir bi derekê ketiye li hawarê çiyê. Ji qenc û weliyan re ka sekn û sekan heye?

Mele Mehmûd bi wî awayê xwe yê taybetî ya nerm û bawerkir jê pirsî.

- Apê Hecî, gelo ev welî û qencê Xwedê ku hene ma ew jî di ser hev re û di bin hev re dest bi dest in, sinif bi sinif in?

69

Te dî gere meriv ji hikmetê Xwedê xafil nebe. Lê meriv bala xwe didê gava kerametê hinan wek yê Mele Yehya azlû dibin,

ew tafilê pê dimirin û yê hin weliyên Xwedê yê wek  
zatê te -ku tu êiktê tune- azlû dibin, tiêtek bi wan nayê. Ev  
çawa dibe gelo?

- Lê çawa? Xwedê jê razî! Ehlê keramet giêt ne nola hev  
in. Hin jê hene; ne ew bi xwe zanin û ne ehlî bi wan dizane,  
lê îla her Xwedê bi wan dizane. Hin hene; ew bi xwe, bi xwe  
nizanin, lêbelê ehlê dora wan bi wan dizanin û Xwedê bi  
wan dizane. Desta sisiya; ew bi xwe bi xwe dizanin, Xwedê bi  
wan dizane, lê xelk bi wan nizane. Gava kerametên van hersê  
sinifan aêkera dibin, tafilê pê dimirin. Vêca destek dîtir  
heye ku hem ew bi xwe dizanin, hem xelk bi wan dizane û ji  
xwe Xwedê jî bi wan her dizane. Gava kerametên ehlê vê  
desta paêiyê aêkere dibin tiêtek bi wan nayê, ji xwe herkes pê  
dizane.

Mele Mehmûd:

- Dibêm ewê van ên paê ji merteba herî bilintir bin, ne  
wisa gelo?

Hecî Mihemed Elî:

- Lê çawa? Xwedê jê razî! Ma êiktê heye?

Mele Mehmûd:

- Ez dibêm tu jî ji van ê han î, ne wisa?

Hecî bi dilxweêdi maneya lterê wisa ye" de biêirî û got:

- Alimê xeybê her îlelah e.

Mele Mehmûd:

- Maêelah û elhemdûlillah! Lê ez li vê ecêbê êaêdimînim,  
apê Hecî . Zatên mîna te ku wisa ehlê keramet û marîfet in;  
gelo hikûmat çima ji bona selihandina karûbarê xwe û yê  
xelkê wezîfe nade we? Ya gelo pê nizane, çi behs e?

- Çawa? Dibe ku hikûmat pê nizanibe, Xwedê jê razî!

Heryek ji wan bi wezîfekê wezîfedar e.

- Meqseda min ev bû ku gelo hikûmata me ka wezî:feke,  
ez çî bêjim mîna xefiyetî an casûsî da te neda te?

- Lê çawa ...

- Ev efendî jî ne xerîb in, hevalên me ne. Tu ji kerema  
xwe re ji me re behsa wezîfa xwe bikî bira ew jî pê bizanin.

- Mele Mehmûdê min î delal, çend sal berê li Bismilê qeymeqam  
kî qetrehm î zalim hebû. Hikûmatê ew kiriye qeymeqam  
û êandiye Bismilê, lê hikûmata reben ji ku derê bizanibe  
ku di dilê wî de kudikên berazan hene. Merivê êrê  
xav vexwarî, ew jî dibêje ' êdî ez bûme qeymeqam, ka di ser  
min re kî heye ... Kî dikare çî ji min bike ... ' Li xelkê bi kêfa  
dilê xwe tehde û neheqî dike. Ji jor de ji min re xeber hat,  
gotin "çika here binêre ev çî bela wî ye. Xelk çima jê gazin  
dikin?" Min hespê xwe derxist, teng û berlenga wî lê êidand,  
xurcika xwe avêt serpêtê û berê xwe da ber bi Bismilê ve. Ez  
ketim nav çarêiya Bismilê hê piêtî nîvro ye, êdî mamûr ji firavînê  
dizivirin. Carekê min bala xwe dayê ku Qeymeqamê  
min û te li ber yekî gundiyê ku wî avêtiye erdê; bi dara lê dixe  
û jê re dibêje "êêkoxlî êêek! Kerê te çima li nav rê rêx kiriye?".  
Di nav destûpiyê vî zalimê Qeymeqam de, zarebara  
vî merivê gundî ye ku rebeno bi tirkî jî nizane da cewaba  
xwe bide. Bismilî jî ji tirsê vî zalimî; yên ku ketine dikanên  
xwe, xwe melisandine, yên ku ketine ber rîknên serê koêan û  
xwe veêarline. Wele ez çûm ber Qeymeqam, çik ji hespê peya  
bûm û bi qamçiyê xwe bi Qeymeqam ketim; , goliko soro

te çi xwariye!' Gote min "Ûlan tu zanî ez kî me? Ez qeymeqam im. " Wele min guh nedayê, min ew li erdê di rêxa kerê de gevizand. Mêrikê gundî rabû li riya xwe çû û ez jî

71

çûm hikûmat qûnaxiyê dayira qeymeqam. Bekçiyê ber deriyê oda qeymeqam gote:"Tu kî yî, çi dixwazî? Qeymeqam efendî hê nehatiye." Min tehnekê lêxist û ketim hundir û çûm li ser masê rûniêtim. Qasek tê bihurî Qeymeqamê min û te sergirêdayî hat ket hundir û çav bi min ket, got:: "Ûlan tê hem di nav çarêiya Bismil de li min xî , irzê min biêkênî û hem jî werî di oda min de li ser masa min rûnêy? Binêre ezê çi bînim serê te." Min bi hêrs got "parlo! "(\*) Tafilê xwe da hev. Min gotê" Ji vê deqîqeyê pê de min tu ji qeymeqamiyê avêt. Ji niha û pê de tu ne qeymeqam î û ne tiêtekî yî. Siktir be ji ber çavê min here." Xwe avêt ser destûpiyê min, giriya got: "Eman di bextê te û Xwedê de me, ez piçûk im min cahilî kir, tu mezin î efû bike. Tu min bidî xatirê zarûk û zêçê min." Min got: "Kerê kurê wî kerî! Gava te li feqîr û hêsîran tehde fikir xweêbû? Zarûk û zêçên te çima wê gavê nedihatin bîra te? Haydê yelah baqalim ... "

Wele çendê wî alî li Diyarbekirê bûm, ji min re hin mîx û hacet lazim bûn. Min got ka senkî li çarêiya îspahiyê jî xim. Min bala xwe dida xerûper êtûtebayên li ser ereboka, min dit yek gazî min dike: "Mihemed Elî efendî! Mihemed Elî efendî!" Ez lê zivirîm, min ew nenasî. Min gotê: 'Xêr be min tu nenasî, tu kî yî?' Stûyê xwe li alîkî xwar kir û gote min: "Malava çawa te ez nenasîm? Ma nayê bîra te? Di filan salê de ez qeymeqamê Bismilê bûm, te ez jê avêtim. Ji

bona rizqê zarû û zêçê xwe niha liber vî desgehê me û bi van hesin û bizmarê zengarî nifqê wan derdixim." Ez biêirîm û min gotê: "De bixo kero çawan e.... Xwedê dabû te, te nizanibû bixwara. Ma tu nizanî ku pêstûrî ji gayê cot re jî namîne?" Got: "Erê weleh Mihemed Elî efendî ez poêman bûm, lê êdî ji destê min filitî."

72

Mele Mehmûd destên xwe di hev de miz dan û bi êîranî gotê:

- Maêelah! Subhan ji wî Xaliqî re! Xwezila çend kesên dîtir jî wekî te hebûna. Lê wayê çawa biye ku te ji bîr ranekiriye? Bi Xwedê kî apê Hecî bi casûsî masûsî qet neçûyî nav dewletên ecnebî?"

- Lê çawa. Hê zemanê rehmetiyê Menderes bû. Rojek Elahûalem çî roj bû nizanim, hatim malê xatiya we got: "Polêsekî hat malê li te pirsî. Got ku Mihemed Elî efendî çî gav were malê bira esehî nesequine bê Qeymeqam efendî bibîne." Hela! hela! Xwedê xêr ke. Hema ji ber derî zivirîm, çûm qûnaxê, derketim hizûra Qeymeqam, min gotê: "Xêr e? Te ez xwestime?" Qeymeqam efendî rabû piya temena kir, got: "Haêa! Mihemed Elî efendî çî hedê min e. Wele Walî efendî têlêfon kir û got: Ecele Mihemed Elî efendî bibînin û bêjinê bira were vê. Êdî çî ye çî nýne pê nizanim." Êh ji xwe karûbarê riya min kiribûn. Siwar bûm çûm Diyarbekirê. Derketim hizûra walî efendî, min pate lêxist û got: Kerem ke Walî efendî te xêr ê. Walî efendî rabû temena kir û got: "Mihemed Elî efendî ez nizanim çî ye, çî behs e, lê baêekîl (serekwezîr) Ednan Menderes têlêfon kir û

got ecele li erd be li esman be gere hun Mihemed Elî efendî bibînin û wî biêînin vê derê. Hertiêt hazir e, hema em li hêvî. ya tene. "

"Min da hiêê xwe ku karekî muhîm nîn be Menderes gazî min nake. Serê we neêînim, ez çûm Enqerê, derketim qûnaxa Menderes, nobedar li ber derî bûn, gotin "dûr!"(\*\*) Ez li wan fetilîm û min got: "parlo!" (\*)Wele pate lêxistin. Min derî vekir û ketim hundir ku wayê Menderes li odê wek feqiyê ku dersa xwe mutale bike, berûberê odê diçe û tê. Min 73

patekî jê re lêxist. Ku çav bi min ket, kêfa wî hat, beêera wî xweê bû û got: 'Wey Mihemed Eh efendî bi xêr û bi ser çavan re hatî. Misêwa min rêpaniya te dikir.

"-Êh xêr be Baêwekîl efendî, te ez heta vê derê aÎûm. Hêcrana vê çi ye. Nebê sebeb e." Rehmetî kûr kûr fikirî û li min veqerî, got: " Na wele Mihemed Eh efendî ne bê sebeb e. Ji Îngilistanê pîlanek ji me re lazim e, û ferz î ferz lazim e. Casûsên me yên ku çûn bînin, ya asê bûn nema derkevin ya hatin girtin. Vêca em fikirîn, me got hebe tunebe yê ku bikare me ji vê tengasiyê derxîne bi tenê ewê Mihemed Eh efendî be. a wele niha em lite tiliqîne."

"Çi bikim? Biye cil û ketiye mil. Wele rabûm çûm Îngilistanê, pîlan û tiêtinên ku lazim bûn min berhev kirin. Li kuçekî Îngilistanê digeriyam, bala min pêket ku du meriv li dû min in nêzenêz taqîbata min dikin. Ez sekinîm. Min guh dayê ku yek ji yê dinê re dibêje"van vîng vonk." Yanî tu zanî, ev casûsê tirka ye. Wele min jî necamêrî nekir, liwan zivirîm, min jî got "fm fan fonk fýnk fank?" yanî qey ez nizanîm

hun jî casûsên Ü1gýhz in?" Ew ji pey min vebûn.

"-Ez zivirîm hatim Tirkiyayê, Enqerê. Çûm qûnaxa Menderes, di derencan de hilkiêim hatim ber derî. Nobedar gotin

"dûr ûlan!" Min got ûlan bavê we ye, êêekoxhêêek! Parlo!

Wele tafilê xwe dan hevûdu û pate lêxistin. Ez ketim

hundir ku Menderes li ser masa xwe rûniêtiye û mitale dike.

Çawa çav bi min ket, çirçên eniya wî ketin hev û got: "Mihemed

Eh efendî malava ka tu hê livan dera yî, hê neçûyî?"

Min gotê: "Baêwekîlê min ez çûm û hatim." Wele min rakir

ji bin çengê rastê lûlikeke kaxiz, ji bin çengê çepê yeka di, ji

milê rastê yek, ji ber milê çepê yeka dîtir , ji ber gora rastê

lûlikek, ji ber gora çepê yeka di, ji navrana êalyekê, ji berî-

74

kên saqo Û êalwar yek bi yek lûlikên kaxiz derxistin, li ser

masê li ber Menderes kire lod. Menderes li loda ber xwe û li

min nihêrî, lêva xwe hilkir û gote min: "Malava ev çi hal e?

Hema te giêta bikira destik û bikira derekê." Min gotê: " Ev

karê casûsiyê ye, ne yê baêek"Jtiyê ye. Ne karê zarûk ye,

efendî! Bi rê de oxilme moxilme dibin, te dît ku lûlikek qefaltin,

qe nebe yên dinê xelas dibin." Menderes serê xwe rastû

çep hejand û got: " Welahînê Xwedê sed sal bimana min

vê fehmê nedikir. Helal be ku tu bera Mihemed Elî efendî

yî." Min gotê: "Baê e, emrê hikûmatê û xizmeta dewletê li

ser ser û li ser çavê min. Lê qey timî ewê karê bi vî awayî di

stuyê min de bimînin. Ev qeliyan? Ji casûsê dewleta Alî Osman

kes nema? Lê sibêroj ku bimirim ewê çawa be?" Rehmetî

got:" Qet behs meke. Îro çend roj in ez jî lê difikirim."

- Qey ne wisa ye? .Kakî vê famê dike?" bi awayê pesindanê

Mele Mehmûd got û jê pirsî:

- Gelo qet bi casûsî an wekî dinê, riya te bi nav Êris neket?"

- Lê çawa.. .xwedê jê razî!

- Halê wan çawa bû gelo, miamela wan bi çi awayî bû, tu bi çi karî çûbûy?

- Halê wan? De ka ewê halê wan çawa be? Genim tune, ceh kê m e. Hêsîr dar dihêrin, arê daran li nav arYan dixin, dîkin peksîmat û dixwin. Ne ji vî awayî be halê wan bê e. .Kafir te dî ji hevûdu re bi aqûbet in. Herwisa ji dînê xwe re jî pir êedîd in. Ez hêsîr bûm di destê wan de. Di herbê de em J'J ketibûn. Wan ez birim bajarekî, qulikek xam dan min. .Karê min ew bû ku rojê carekê herim qereqolê xwe m-êam wan dim. Rojekî qomsêr gazî min kir, bi awirekî tûj li min nihêrî û gote min:"Tirko! Çavê xwe baê veke, baê guh 75

bide min. Tu tirk î, bisilman î. Tuyê mîna tirkan li xwe ki û tevbigêrî û wekî bisilmanan bêj û taeta xwe bikî. Em qebûl nakin ku tu wek erfûedetê me ûrisan bikî, herî dêrê an dev ji dînê xwe berdî werî ser dînê me. Tu li ser dînê xwe û em li ser dînê xwe."

- Gelo çima nedixwestin ku haêa tu herî ser dînê wan û wek erfûedetê wan bikî?

- Bi fikra wan, hetanî meriv li ser dîn û erfûedetê xwe be, meriv ji wan bi ferqtir e. Meriv bisilman e, li ser dînê xwe ye û ew jî fileh in li ser dînê xwe ne. Meriv û ew tevîhev nabin. Ka pez û gur dikarin tevîhev bibin? Lê gava tu herî ser dînê wan, -ê hestiyê helal haram, yê haram jî helal nabe-, çawa be jî ewê damar bikêine, tê tiêtên wan hîn bibî û bi casûsî neqlî



Tirkîyayê bikî. Ew jî vê qebûl nakin.

- Subhanelah çi kaHrekî jîr e kur-ro ? Tam bi îêê xwe zane.

Lê em vê li alîkî bihêlin. Karê dinyayê te dît li dinyayê dimîne. Ji xwe Xwedê xêra te jê hasil dike, îne-ellah. Lê wekî dinê hin tiêt hene ku ne bi destê hikûmat û ehlî ne. îla bi destê Xwedê, bi îcaza Xwedê jî bi destê we qenc û weliyên Xwedê dise1hin. Herwekî em bêjin wek tofanê, agir û êewatê, lehiyê. Te dî Xwedê haêa bi zat û saetê xwe nayê yan jî em bêjin ku agir bi derekê ketiye û taxekê, gundekî an bajarekî daye ber xwe, ê Xwedê ezze-we-celle bi xwe nayê destê xwe nade berê. Emir dide qencekî xwe, welîkî xwe, ew weliyê Xwedê bi ÎZna Xwedê destê xwe dide ber wê qisûmatê û ew disekine. Gelo qet tiêtekî wisa bi serê te de hat an ne. Ev pirsê li ser mesela binê kundir bû ku Mele Mehmûd jê dipirsî.

- Mele Mehmûdê min, êtên ji bona Xwedê di riya Xwedê de ne. Çend sal berê baraneke gurr bariya. Du-sê hefte bi êe-76

vûroj, bê çav vekirin, mîna devê meêkê misêwa ev bimbarek dibariya. Li kuça çokek lehî rabûbû, îbadulah nikaribûn ji malê xwe derkevin derva. Êh ji destê evdên xafil jî êtekî nayê, ewê evdê reben çi bikin, çi di destê wan de heye?

"Şevêk piêtî limêja eêayê dereng, xatiya we ket nav ciya û raza. Yê min jî hin mijûlahiyên min hebûn, ez pê bill bûm. Min ew qedandin, êdî karûbarê nav ciya kir, min nihêrt deriyê me yê derva lêket. Hela! hela! ... Vî wextê ha ewê kî be. Şev yek û xerab gelek! Te dî divê meriv hesabê xwe bike. Qotek tifinga min hebû, min ew ji pîncê dîwêr anî û ez çûm

pêt derî, min lê deng kir: "kuro tu kî yî?" Dengekî hate min, got "ez im, derî veke." Hela! hela... ev kî ye. Te dît qenc hene ... xerab hene ... meriv nizane. Min dengê xwe piçek bilintir kir: "Kuro lawo tu kî yî?" Dîsa got: "Ez im û ez im, derî veke!" Êh êire-êira baranê ya Îlahî wisa gurr e ku; meriv dengê nas jî ji hev dernaxe. Ez aciz bûm, wele min sirma tifingê qelabt û êekê da berê -te dî meriv nizane qenc hene xerab hene, vê êeva Xwedê vê saeta ha ... çi zanim- û min gotê: "Kuro lawo ez ji te re dibêjim, tu kî yî? Çi kes î?" Deng vêca bilintir bû û got: "Mihemed Eliyê min lawo tu kor bûyî? Ez im, xeriliyo ez im!" Min derî lê vekir ku himet û bereket her timî hazir be. Xwedê celle-we-celallahû bi zat û si:fetê xwe li ber derî ye. Ez kolý dest û piyên wî bûm. Min xwe da alîkî derî, rê dayê ku were hundir û pê re jî min gotê: "Ya Rebî vê êeva ha li te xêr e? Kerem ke were hundir." Gote min: "Mihemed Eliyê min lawo! çi hundir e, çi hal e? Tu nabînî ku îro serê çend êevû çend rojan e ku esman qeliêiye û tê de baran nasekine. Ev kar karê te ye, divê tu herî esman pîne bikî." Min gotê: "Ya Rebî! Ez rebenê Xwedê û ev karê ha!" Gote min: "Na lawo! Îmkana wî tune

77

ye divê ru bikî." Min got: "De ka ez herim êalê xwe li xwe kim, ez tazî me." Gote min: "Lawo êalê te lite ye." Min bala xwe dayê subhanallah bera jî êalê min li min e. Lê ez baê pê dizanim ku ez bi tena derpê û kiras hatibûm. Min gotê : "Bê e, herim çakûç û bizmarê xwe bînim." Gote min: "lawo! Tu çi merivekî bêsebir û xafil î. Lberikên êalêxwe binihêre." Min berikên xwe oxilme kirin, di ya rastê de çakûçê

min û di ya çepê de jî mîxên zêrîn." Min got: "Ez hazir im. Ka ezê çawa herim?" Got:"Tu çi evdekî min î bêsebir î." Min ha bala xwe dayê ku erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû û esman nizim bû, erd bilind bû weleh hetanî ku esman hat ber fesala destê min. Min bala xwe dayê ku di nivî de çî qelêekî lêketiye. Min destekî avêt keviya qelêeya rastê, yekî jî avêt ya çepê û got: "Ya bi qewet û hirneta Xwedê û Resûlê ekrem! Ya Şêx Evdilqadirê Gêlanî û Şahê Nexêebend!" bi hemî hêz û taqeta xwe min herdû keviyan kiêandin ser hev, bizmarê xwe danî ser, bi çakûçê xwe kuta. Piêtî ku min ew baê bizmar û asê kir, karê min qediya. Êdî ji berê xwe ve bi hikmeta Rebê jorîn erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, erd nizim bû û esman bilind bû, ha min dît ku ez li ber deriyê malê me. Ketim hundir, min derî çengel kir. Çûm odê, xwe êêlihand, lembê zenûn kir û ketim nav ciyan. Xatiya we ji xewê veciniqî û got:"Wîêêê!Meriv dibê qey ru ji nav teyrokê têy, ev çi halê te ye?" Min gotê: "Herê korê ru bizerê razê! Tê ji ku derê zanibî ku ez ji ku deAre tAem.?"

"Hecî Mihemed Eliyê Qelêo", "Mihemed Eliyê Qelêo" weyaxud tikûtenê "Qelêo": Min navûdengê vî camêrî zû de, hê ji zemanê zarûtiya xwe bihîstibû. Lê ji min re mîna yekî ef-78

sanewî dihat: Wekî mala zalê, Betal Xazî, Herkul an hin kesên dinê. Min nizanibû ku Mihemed Eliyê Qelêo an Hecî Mihemed Eliyê Qelêo hê jî dijî û yek ji endamê civaka me ya wê rojê ye. Loma gava ku ew bi min dan nasîn wekî ku di

xewnekê de bim, wisa êaê mam. Wisa êaê mam ku; heta bi bersîva cara pêêiyê îqna nebûm, du car sê car min ji Fikrî Xoce û Mele Mehmûd pirsî da ev camêr ew Qelêo ye. ZJamekî bi bejna xwe ne kurt û ne jî dirêj bû. Di seriya êest salî de bû. Bi canê xwe genimgûniyê girtî bû. Riyekî êinboz î fereh lê hebû. Destên wî fereh û gir bûn; xuya bû destên kar û xebatê ne. Şewqeke ji wanê Dawid Nêrgiz malê Diyarbekirê li serî, saqokî lacîwerdê bi ser xêzên spî yê qaçax û êalwarekî reê lêbû . .Karê wî hostatî bû: Hostayê xanî lêkirinê, yê aê danyn û niqarkirinê, yê haletê cot û xeratiyê bû. Hostayên bi vî awayî li gundê xwe timî kar nabînin; seyar in, li ku derê kar hebe çendekî ji mala xwe bi dûr dikevin, li ciyê kar-lê-heyî dixebitin, di pey xelasiya karê xwe de dizivirin mala xwe.

Xêrnexwaz û çavnebar gelek in. Bebestî bi hecîtiya wî de jî anîbûn. Dibêjin ku du sê roj berî hecîkî ji gundê wî ji Hecê bizivire mala xwe, Hecî Mihemed Elî tesadufen li Diyarbekirê, li otêla Çelîk Palasê ye. Qeflekî hecî berî yê gundiyê wî ku hatine, ew jî li wê otêlê ne. Hecî Mihemed Elî pirsê wan dike, li halê rêwîtiya wan û yê tengasî û zehmetiyên wan ên li Hecê dike. Di pey de pirsê gundiyê xwe yê ku çiyê Hecê dike. Ew jî dibêjin: " Wele elhemdûlîlah ji aliyê sihetê ve baê e, li heyatê ye. Lê tiêtê ku heye li ser Girê Erefayê cizdanê wî yê pera jê dizîn. Rebenê Xwedê yê bêçare kir qareqar û hawar. Êdî misJmanên dorhêlê xêra xwe jê re destmal vekirin pere berhev kirin." Ew jî dotira rojê ji Diyarbekirê berê

79

xwe dide malê, tê gundê xwe. Yê selavê lê dîkin an pirsê wî

dikin, bi wan de dixeyide, dibêje: "Heyla fasiq û zindîqno! Ez ji mala Xwedê, ji Heca êerîf têm û wek hecîkî hun nayên seredana min." Gundî êdî naçar bawer dikin, diçin seredanê.

Ew jî teberikên mîna tizbî, xelek û hwd ku ji Diyarbekirê kiriye û bi xwe re aniye li wan belav dike. Du-sê roj êûn de,

heciyê gundiyê wî tê. Gundî diçin seredana wî jî û dibêjin:

'Wele elhemdûlîlah wayê tu jî û Hecî Mihemed Elî jî hun bi saxî û bi selametî vegerin, ji gundê me îsal du hecî derketin.'

Heciyê dinê dipirse" Hecî Mihemed Elî kî ye, hun

behsa kîjan Mihemed Ellî yî dikin?" Jê re dibêjin: " Hecî

Mihemed Elî lo! Yanî Mihemed Eliyê Qelêo." Mêrik hêrs

dibe, xwe hiltîne li erdê dixê. Dibêje: "Hiêk û ji binî derewe.

Qeêo nehatiye Hecê." Ev gotina wî tê bi guhê Hecî Mihemed

Elî dikeve. Êvarê tam wextê ku gundî li mala heciyê dinê

ne, Hecî Mihemed Elî radibe diçe seredana wî. Piêtî

kêfxweêî dana hev, Hecî Mihemed Elî di nav civatê de dibêjê:

" Heciyê delal! Hec ewe ku meriv diçe mala Xwedê li gunehê

xwe poêman dibe, li ber destê Xwedê û pêxember tobe

dike ku êdî derew neke, bêbextî neke, heqê xelkê nexwe, neûzû

bîllah tişê heram neke û heqê camêran jî înkâr neke.

Newisa Hecî?" Heciyê dinê dibêje:"Belê, sedeq amentûbilah!

wisan e." Hecî Mihemed Elî dibêje:"Ku wisa be, herê

agir bi malê keto tu çima xwe ji Xwedê dikî û dibêjî 'Mihemed

Elî derew dike, nehatiye Hecê?" Heciyê dinê dibêje;

"Ez qet jî xwe ji Xwedê nakim, tu rýehatî Hecê û li wan deran

jî çavê min bi te neketiye." Hecî Mihemed Elî li wî û

gundiyên li civatê dizivire, dibêje:

- Li ser Girê Erefê, serê sibê berî ku birêkevin herin êeytan

biricimînin, te ji nava serê xwe nekir qîrîn û negot "ha-  
80

war e! gidyano hawar e perê min dizîn!" Gundî vediciniqin û  
Heciyê dinê jî li hevûdu soromoro dibe û dibêjê:

- Tu ji ku ve zanî?

Gundî êaêdibin li wan dinêrin. Lewra Heciyê dinê ji wan  
re behsa her tiêtî kiriye, Lêbehsa vî tiêtî qet nekiriye ku em  
bêjin Mihemed Elî ji wan bihîstibe.

Hecî Mihemed Elî:

- Êh Hecîko! Em herçî hecacên Siliva, Bismil, Hezro û  
Batmanê me xêra xwe destmal venekir -Xwedao tu ji xêrê  
dernexî!- û ji te re pere berhev nekir?

Heciyê me yê dinê bêtir êaêdibe û bi awakî êeqizî û berxweketî  
dipirse:

- Êra tu ji ku zanî û era bi xatirê Xwedê tu ji ku pê dizanî?

Hecî Mihemed Elî bi ser gundiyê xwe yê bextreê de diçe:

- Ez hê jî bêjim?

Bersîv ji Hecî û deng jî ji gundiyan dernakeve. Rastî û heqiya  
çûna Hecî Mihemed Elî ya Hecê ji aliyê ometa Mihemed  
ve tê pejirandin.

Demek kurt di pey hevdiatina me ya wê rojê de ji Siliva  
çûm. Di dawiya tîrmeha ý967 an de zivirim. Mele Mehmûd  
êdî li ber dikanê nîn bû. Niha di karekî dîtir de bû. Me  
hevûdu dît, pirsra hevûdu kir û li hal û ehwalê dinyayê pirsî.  
Mele Mehmûd ji min re got:

- Lê! Malaminê! Hecî Mihemed Elî wefat kir.

- Kîjan Hecî Mihemed Elî, gidî?

- Hecî Mihemed Eliyê Qeêo.

- Na lo! Çawa? Bi çi awayî?

Mele Mehmûd:

- Di wan rojên nebixêr yên êerê Îsraîl û ereban de bû. Ez

SI

li ber Tekelê rastî wî hatim, min pirsî wî kir. Nexweê bû, bêkêf bû. Dinaliya. Min jê re got "Bi Xwedê kî apê Hecî ev cihuyê Îsraîl tovê Îslamê brand, erebên ometa Mihemed qelandin.

Gelo hun qenc û welî çima li hawara birayên me yên ereb naçin?" Gote min:" Em çawa naçin? Wele em diçin lê ji destê me hew tê.Şevtira dinê ez bûm, Hezretî Mihemed bû, Hezretî Elî êerê Xwedê bû, Şêx Evdilqadirê Gêlanî bû, Şahê N exêebend bû; em çûn ku herin li hawara ometê. Me gava ji dûrî ve bala xwe didayê; bisilman û kafir ji hevûdu kê bûn, erê evên ha bisilman û yên dinê cihû ne. Lê gava me êrîê dikir û em diçûn bi ser de hema giêt mîna hev xuyan dikirin. Me serî dibirî:fi, ji dil xwe ve ku neyarê ometa Mihemed in, cihû ne; piêtî ku em ji êer fereh dikiên û dinihêrt malikê tu xera bî ku kuêtîyên ji destê me giêt ereb in.

Êdî kafir û bisilmafî tevlihev bûne, di navberê de ferqekî nemaye.

Me kir û nekir heta fecra sibê me tiêtekî havil nekir û em vegehin. A tu dibînî ji wê êevê de ye min serma girtiye, wê sermayê pîs a çola Erebianê ye û bi Xwedê ez dizanim ku filitandina min jî jê tune." Min gotê "Na û devê xwe li xêrê veke, apê Hecî!" Gote min "Na! na! Birîndar bi birîna xwe dî.zane. "

"Di pey de çendekî derbas bû, rojekê meleyê camiya T ekelê selatan da û di pey de wefata wî ragihand. Ez çûm hawariyê.

Min li hal û hewalê mirina wî pirsî. Ew roja ku ewê

tê de bimire, dibejê gazî mele bikin. Gazî melê taxê dikin.  
Rehmetî dibêjê: Dest pê ke bi ser min de Yasînê bixwîne."  
Mele du dewr Yasû1pê de dixwîne. Di dewra sisiya de tê heta  
nivî, rehmetî jê re dibêje" mele bes e!" û pê re ber bi esman  
dinêre û dibêje"de were! de were emanetê xwe bistîne!  
De haydê were li hêviya çi yî?" û pê re jî çavê xwe li ronahiya  
82

dinyayê digire. Ev bi xwe gotina maliyên wî ne."  
Ez berdiketim. Mele Mehmûd berdiket. Lê Niyazî hosta  
bêtir berdiket. Ji herkesî bêtir berdi.ket û digot:  
"-Rehmetî weliyekî xas bû. Bi welîtî û van hikmet û kerametên  
xwe yên ku ji me re digot ji tu weliyekî ku em dinasin  
kêmtir nm bû. Lê heyf û mixabin ku ne yekî ereb bû. Heyfa  
wî ku umî bû, bi erebî nexwendibû an bi erebî nizanibû. Ku  
ereb bûna; ewê van serpêhatiyên wî bi erebî binivisandina,  
bikirina kitêb û ku hema kitêb bigota: ' Qale Mihemed Elî  
-qedeselahû sirrehul ezîm- i Ê van tiêtê wî vegotina, we dê  
bidîta êdî ji xwe re. Heyf! Heyf û mixabin!"  
Hecîkî hebû. Hecî Mihemed Elîkî hebû. Hecî Mihemed  
Eliyê Qelêo (radiyelahû teala enhû).

nparlo: parola, parole

rO) dûr (dur bi tirkî): raweste, bisekine.

83

WEŞANtN NÛDEMÎ

- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ Celadet Alî Bedir-Xan I Gramer
- Dê Ê DtMARî Egidê Xudo I Roman
- KF5KF50R NtUed1n Zaza I Çîrok
- DI FOLKWRA KURDÝ DE SERDFSriYEKE JINAN Rohat I Lêkolîn



- HÛ Û BEDEWIYA PÊNÛSê Mehmed Uzun I Ceribandin
  - MÝRZA MEHEMED Medenî Ferho I Roman
  - Mýyn EVÝNê Rojen Barnas I Şiîr
  - ZAROKAŞMJacklondon Werger: Mustafa Aydogan I Çîrok
  - BIYANÝ Albert Camus Werger: Fawaz Husên I Roman
  - MÝRZArt BÝÇÛKA. de Saint-Eksupeýy Werger: Fawaz Husên I Çîrok
  - GarIN Yaşar Kaya I Ceribandin
  - ANTOLOJIYA ÇÝROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛRXdîl Duholû
  - şEvÊN SPÝ Dostoyevslû Werger: Fuat Cewerî I Roman
  - MIŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî I Roman
  - BEXÇEIT vtŞNE Çexov Werger Firat Cewerî I Piyes
  - LI BENDA GODOT Samuel Becket Werger: Firat Cewerî I Piyes
  - GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Firat cewed I Aforîsma
  - GIRTÝ Fuat Ceweri I Çîrok
  - KEVOKA Spî Firat Ceweri I Çîrok
  - KULTUR. HUNER O EDEBIYAT Firat Ceweri I Ceribandin. hevpeyvîn
  - XFZAL S1ma Semend I Çîrok
  - EVÎNA REBEN Duwê, M. Ferho I Şiîr
  - BANGA HAWmMedeyû Femo I Şiîr
  - KULTUR O RAMAN şuefun ciziri I Ceribandin
  - KUê ZINAê SERBIUND Sidqi Hirori I Roman
  - şýîên BIJARTE Mayakovski Werger: Süleyman Demir Şiîr
  - PêrtN BÊRtKIRINêMusta&Aydogan
  - ŞEREF A WENDABOYt YA KATHARINA BLUM  
Heinrich Bön Werger: Şahinê Bekirê Sorddi I Roman
  - HINGê Rojen Bamas I Çîrok
- Ji ber qedexebûna zimanê kurdî ya heftê salane, li bakurê welêt êdî kurdan jî bawer

nedikirin ku zimanê wan têra edebiyateke  
modern dike. Di dawiya salên 70'ê de,  
Rojen Barnas bi pirtûka xwe ya şîran Li  
Bandeva Spêde, mîna stêrkeke hêviyê li ezmanê  
welêt yê bêhêvî çûrisî. Navê wî di  
kurtedemekê de li seranserî welêt belav bû.  
Ew ji bo nivşê nûhatî bû çavkaniya nivîsandinê  
û ji edebiyata kurdî hezkirinê. Her  
di wan salan de, wî bi çîrokên xwe yên mîzahî  
ku bi navê Flît Totanî di kovara Tîrêjê  
de diweşandin, hem kurd dane kenandin,  
hem jî ew dane fikirandin.  
Rojen Barnasê ku mîna şaîr û bi pirtûkên  
xwe Li Bandeva Spêde, Heyv Li Ezmanê  
Diyarbekirê û Milkê Evînê navdar e;  
bi van çîrokan nîşan dide ku ew hostayekî  
çîrokê ye jî.  
Weşanxaneya me bawer e ku Hingê  
rengê nû dide edebiyata kurdî ya modern  
û pirtûkxaneya kurdî ya jar dewlemend  
dike.

Weşanên NÛDEM

\*\*

KADÎNA MIŞKAN

Zeynelabidîn Zinar

PENCÎNAR

WEŞANXANEYA ÇANDA KURDI

Zeynelabidîn Zinar

Kadîna Mişkan

çirvanok

Pencîdar

Weşanxaneyê Çanda Kurdi

Stockholm 1993

Pencînar

Kurdiska Kulturförlaget

Weşanxaneyê Çanda Kurdî

Box 3088.16103 Bromýna/Stockholm- SWEDEN

@ Zeynelabidîn

Kadîna Mişkan 1993. çirvanok

Wêneyê Berga Pêşî: Kemal

ISBN91 97209007

Ji Konfuçyûspirsîne:

- Eger tu Ji bo îdarekirina welêt bihatinayî vexwendin,

karê ku pêşî te yê bikira çi bû?

- Bêguman bi destpêka îş re min ê ziman di ber

çavan re derbas bikira. Lewra eger ziman bi

kêmasî be, peyvin fikirandineke rind diyar

nakin. Fikirandin Jî ku rind diyar nebin,

pêwîstiyên ku bêne kirin rast çênabin. Berpirsyaî

ku rast neyêne kirin, çand û tore xirab

dibin. Tore û çand Jî ku xirab bibin, berambertî

(edalet) dikeve rîyeke şaş. Berambertî Jî

ku Ji rê derbikeve, xelkê ku dikeve heyretê

nizane çi bike û nizane wê bigîje kur. Ha Ji ber

vê yekê ye ku tiştêkî mîna zimên bîrjîyan û

girîng tune.

Bo şadlya Serokê Nemir Îhsan Nûrî Paşa.

- 1-

Serbajarê bi navûdeng bûbû xweziya gelek paşa, siltan, mîr, qiral, key û keywanên diyayê. Ji ber dewlemendî, stratejî û xweşiya wî, bi gav û demê her kesî dixwest ku wî Bajarî rojek berî rojekê ji xwe re vegire û bo xwe bike wargeheke niştîmanî, tê de kêf û sefa xwe bike û şan û şerefa xweji dinyayê re bide nîşandan. Lê Paşayê wî mirovekî pir bi hêz, gelekî xurt û bi saw bû: xwediyê leşkeriyeke pir giran a bi rêkûpêk bû. Serbazên wî tev peyane neheng, cegerpola wisan fêris, mêrxas û cengawer bûn.

Herweha ew zilamine gir î qirase yên bi zendûbend bûn ku timî ji şer û qadan re li pêdarê sekinî bûn. Ha ji ber wê yekê tu kesî nediwêriya ku awirine bêmirêz bide tixûbên welatê Kurzad Paşa.

5

Welatê bi navûdeng pir fireh, gelekî mezin û bi deşt û çiyayên xwe ve xemilî bû. Deştên wî yên avî her cûre fêkî, zebze û meywe diafirandin. Çiyayên mezin î pahn digel newal û geliyên tije dar û bi daristan xwe ji bihiştê zêdetir bihadar dikirin, yek li dû yekî xwe rapêçî hev kiribûn û li hawîdorê welatê xwe seredor dibûn. Welêt tixûbê xwe yê Rojhilatê gihandibû ta bi Çîn û Maçînê. Tixûbê Rojavayê,

digihî nêzî Tengava Tengavstanê. Yê Bakûr, gihandibû  
çiyarêza Çiyayên Qafqasê. Ji Başûr ve  
jî tixûb digihande ta bi Mala Xwedê û piraniya  
Berrîstana sîlekan xistibû nava cergên xwe.  
Li kêleka Serbajarê Welatê Rojhilatê ji aliyê  
Rojhilat ve çemekî mezin dibihurî û bi bez û  
colan diçû ta xwe digihande ser delava  
ecemoşkê. Bilindiya Bajêr ji ava çemê pîroz,  
sed metre û ji sawiya ava deryayê jî şeşsed û  
pêncî metre bû. Li ser wî çemê bi xêr û bêr kelekvanî  
ji xwe re timî kêf û colan dikir û bê  
govend û şahî nediman. Xortan li herdu  
keviyên wî qor bi qor rêz digirtin, kêfa xwe bi  
lemelema avê re yekser dikirin. Hinek ji wan  
bi şewk û toran masî digirtin, hinekan jî xwe  
tazî dikir û diketin ava hênik avjenî dikirin û  
6  
tê de laşê xwe ji germa roja kel diqêşmandin.  
Herdu navrastên 11keviyên çemê bi navûdeng  
bi darên fêkiyan vegirtî bûn. Xelkê Bajêr di  
rojên şemî û yekşeman de, di yên cejn û  
şahiyan de, xasma di Newrozan de tev diçûn 11  
binê siya wan darên gerrvedayî rûdiniştin,  
geşt û seyrana xwe dikirin û piştî jî xwarinên  
curbicur datanîne ser carcîmên nexşîn û 11serê  
rûdiniştin dixwarin.  
Li başûrê Rojavayê Bajêr çiyayekî  
kevnêtiyê pir xweş ê bi dar û daristan

rûdinişt û singa xwe jê re kiribû mîna mertal,  
da ji jêr ve tu çavine xirab ên gemarî xwe lê  
yektel nekin. Ji Çiyê gelek sarkanî serejêr  
dibûn, 11hawîdorê wan rihan û beybûn xwe 11  
hevûdu pêçabûn û bi bayê beyanê re bihna xwe  
jê re diyarî dişeyandin. Di germa nava rojê de  
keriyên xezal û pezkûviyan bi qefle dihatin ser  
wan kanîsarkan û ava hênik vedixwarin,  
piştire jî diçûn 11binê siya daran mexel dibûn û  
11şewq û şemala Bajarê rengîn hişmetheyran  
diman.

Kurzad Paşa ji wan kanîsarkan ava hênik di  
kunkên qafik de anîbû Bajarê xwe û 11taxan  
belav kiribû. Çi dema ku mirov tasek ji wê avê  
7

di ser savar û goştê berxan re vedixwar, zikê  
dagirtî dimiçiqande ser êkdu û vala dihişt,  
mîna ku xwarina berê lihaş û madela çûbe pêre  
pêre dîsa birçîbûnê xwe diyar dikir û daxwaza  
xwarinê 11dilan şûnde vedigerand.

Li Rojavayê Bajêr, deşteke gewr dikişiya.

Heta ku çavên yekî didîtin xêr û bereketa xwe  
dirêj û fireh dikir. Çaxê bihara rengîn xwe bera  
ser sing û berê gewre yên qal dida, ji bihna gul  
û çiçekên pirtexlît pişika mirov bi sê weqiyan  
giran dibû û diwerpixî. Ji wê bihna xweş î  
şêrîn, firnikên mirov mîna kulfika kewarê  
fireh dibûn û damarên laş jî weke firatan devê

xwe yê bêdiran vedikirin û dengê lemelema  
xwînê digihandin ta sîpanê qoqê meyanê.  
Li bakûrê Bajêr çiyane tacspî wek rêza  
govendê bi êkdû ve besterêz xwe jê re kiribûn  
mîna beden û bi ser êkdu ve dikişyan heta ku  
roj başî li Gola Ormiyê didan. Ew çiyayên  
rengîn timî ji Bajarê xwe re dikenyan û pê dipesinîn,  
ew di nîvê cergê xwe de diparastin. Hin  
caran gava ku ew çiya ji gelî û newalên xwe  
bayê gurr bera ser Bajarê bi şan û şeref ve dihinart,  
dilê xelkê wî hênik dikir û bara şevê her  
kesî xwe 11Zozanê Şerefdînê dihesiband.

8

Bajêr, heçîka di demsalên havînan de tim û  
daîm bi xeyd û giryan bû. Ji ber ku hemû havîn  
jê re ne dost û yar, lê bi germ û ar bûn û ew dikelandin,  
disincirandin û diqelandin, hin  
caran jî dipijandin. Ew rewş û tevger her çiqasî  
ne li xweşê wî jî bû lê bi dilovanî, bi giramî jê  
re singa xwe vedikir û bo xwe çarenûseke  
xwezayê dipejirand.

Çûn û hatina Serbajarê Rojhilatê, pir zêde  
çêdibû. Riyên heft beşên bejayiya dinê di nava  
wî re dibihurin. Bazirganiya herêmên li Rojhilatê,  
ya li herêmên Rojavayî, ya li herêmên  
Bakûr û Başûrê dinyê tev dihatin û li wir digihane  
hevûdu, dest bi kîrîn û firotinê dikirin.

Ji wir jî caw, qumaşê zivr, hevrîşim, pembû,

Uftîk, hirî, kej, çerm û êmîşên hişkkirî  
dikirrîn û dibirin welatên xwe. Kurzad Paşa jî  
baceke hindik ji wan bazirganan digirt û pê  
dewlemendiya xwe serqûç dikir. Ha ji ber wê  
yekê ew Serbajar gelekî dewlemend bûbû, pir  
xweş û şên bû û ji tîcaretê re bûbû hoçik, ji  
dinyayê re jî bûbû mîna serbajarekî sereke yê  
taybetî.

Zengînî, dewlemendî, maldarî, delalî û  
xweşika Uya Bajêr gihabûn b111ndayiyeye  
9

wisan zêde ku tu dev û ziman nikaribûn salix  
bidin. Rê û dirbên wî tev bi kevirên mermer  
hatibûne çêkirin. Kuçe û kolan hemû bi selên  
ferfûrî erda reş vegirtibûn. Xaniyên wî bi  
camên aqût û almast ber bi asîmênê bilind ve  
hilkişiyabûne jorê. girovertiya serên xwe  
xistibûne meyana ewrên reş î tarî û ber bi  
stêrkan ve hilatibûn.

Xelkê Bajêr pir dewlemend. têt, tije û zengîn  
bû. Tu kesî nizanibû feqîrtî çî ye û xizantî ji  
kur e yan li kur dihêwire. Her kes xwediyê xaniyekî  
xwediyê îşê xwe bû, kes ne muhtacê yekî  
din bû. Her kes muhtacê welatê xwe, yê Bajarê  
xwe bû û tev heyranê serwertî û serokatiya  
Bajarê xwe bûn.

Avayiyên Bajêr tev bi yek tentêlê hatibûne  
lêkirin. Çaxê ku mirov diket navbera wan, yek



tê de şaş dima û ji xwe re diheyirî. Eger ne ji  
reqem û navên kuçe û kolanan bûna, tu der ji  
ya din nedihate naskirin. Paqijiya wî rewneqa  
xwe gihandibû asîmanê heşîn û jê tîrêjine rengareng  
berejor diîsandin. Di navbera peyarê û  
riyên mezin de darên tacvegirtî birêz hatibûne  
xemilandin. Li hawîdorê wan gulên rengareng  
mîna rêzên govendê qor bi qor hevûdu girtibûn  
10

Û timî ji mirov re dibişirîn. mîna ku  
bixêrhatinê didane kesên biyanî wisan devliken  
bûn. Leşker û polîsên ku li nava Bajêr digeriyan  
jî xweser alikariya jinên digel  
zarûkan. ya kesên kal. topal û ya piçûkan dikirin.  
Xelkê Bajêr pir ji Paşayê xwe razî bû. her  
kesî jê hes dikir û timî piştgiriya wî dikir. Ji  
ber ku Paşa mirovekî pir comerd. çavfireh,  
zana û bi aqil bû. Wî. çi kêmasiya xelkê  
hebûna hîç dem nedibihurand pêre pêre dianî  
cih. Di dawiya her hef tiyê de jî gazî hemû  
rîspiyên taxan dikir ew dianîn serayê û bi wan  
re dipeyvî. tişt ji wan dipirsî. Eger derd û  
daxwarên wan hebûna. guhdarî dikir. Piştî  
wan kêmasiyên Bajêr yan ew daxwazên xelkê  
yên nû û derd û teşqele ku hebûna. 11cem xwe  
dinivîsandin û roja encûmenê dixistin lîsta  
daxwaz û pêşniyaran.  
Li her taxeke Bajarê bi şan û şeref.

nexweşxaneyek hebû. Li her kolanekê dibistanek  
û ji bo zarûkên şîrmij û yên piçûk çend  
hêlîn avakirî bûn. Li çend herêman jî çend  
xwendegeh hebûn. Xwedina zarûkên dibistanan  
bê dirav. belaş dihate kirin. Xwarina zarûkan,  
1 1

kaxez û xameyên wan tev ji kîsî dewletê bûn.  
Dermankirin û xweşkirina nexweşan, bê dirav  
ji aliyê nexweşxaneyan ve dihate rêberkirin.  
Kurzad Paşê li xelkê xwe û li welatê xwe pir  
difikirî. Wî, tu caran bi tena serê xwe biryara  
tişteki nedida. Mehê carek wî encûmena xwe  
dicivand û yekbiyek bi endaman re dýpeyvî,  
dîtina wan digirt û ji bo kiryarên rind hin  
caran bi hevûdu re nîqaş û dehkere dikirin.  
Piştî kîjan a çê bûna, hemuyan bi yek dengî  
ew tişt dipejirandin û li serê digihane biryarekê.  
Piştî hêj Paşê ew biryar dikirin ferman  
û dida çapemeniya Dewletê, bi hemwelatîyên  
xwe dida zanîn.

Endamên encûmena Paşê çil kes bûn. Her çil  
jî, temenê xwe ji çilî hevrastir bûn û hemû  
mirovên biserpêhatî, bijin û bavê zarûkan,  
herweha kesên sergiran ên jêhezkirî bûn, ku li  
tevayîya welêt qedr û siyaneta wan dihate  
girtin.

Bîst û yek lawên Kurzad Paşa hebûn. Berhîm  
yê mezin, Rêzan jî yê herî piçûk bû. Lê Rêzan

xortekî pir delal î spehî, gelek cindî û lihevhatî,  
xwîyxweş û nazik, û gelekî nefspiçûk bû.

Tîmî ew di suxra xelkê û ya mêvanên bavê xwe

12

de bû. Ji bavê xwe re, bi birayên xwe re pir bi  
aqûbet bû. Jixwe Ji endamên encûmena bavê  
xwe re rêzanî û siyaneteke zêde dida nîşandan.

Herweha ew berpirsyar û serokê giştî yê  
leşkeriya bavê xwe bû Jî.

Navûdengê Rêzanê kurê Paşê li dinyayê belav  
bûbû. Serbaz û serdarên leşeriyên her welatî Jê  
diçoqiyar û sawa wî ketibû ser her kesî. Ji  
pîşeya leşkertiye zêdetir Rêzan pir zana,  
dûrbîn, bîrewer û têgihîştî bû. Ji ber hindê,  
bavê wî hertim pê dişewirî û Ji bo demepêşa  
welêt û ya hemwelatiyên xwe hertim raya wî  
distend û hêj dikete nava kar û îşên giran.

Kurzad Paşa dixwest ku Rêzanê xwe bizewicîne.

Lê sûd û serpêhatiyên wî çewa ku di  
derheqê her tiştî de hebûn, di layê bûkan de Jî  
ne kêmbûn. Ku hin caran bûk bira Ji bira re  
dikin neyar, wan Ji êkdu cihê dikin û malên  
şên û xanedan dikin piçik û parî, bi derbekê  
ditefînin. Ji ber hindê wî tiroş nedikir ku  
hema bi rastî êhatinî Rêzanê xwe bizewicîne.  
Lewra wî diviya keça mirovekî Ji xwe şermkirî  
Jê re bixesta, da Ji malê piştrast bibe û nekeve  
nav rêza karwanê tavilan.

Ezepmayîna Rêzanê Paşê gelekî bala xelkê

13

kişandibû ser xwe û heyfaxuyaniyên Bajêr. ya rîspî û maqûlan pê gelekî dihat: bi sêwirandina dibe hema ku rojekê jineke bêawe wî bişihitîne û li pey xwe bi welatekî dûr ve bibe. Hem li nava xelkê behseke din jî di buwara Rêzanî de belav bûbû ku ango ew nemêr e. lewra bavê wî ew nazewicîne. Îcar ji bo çareserkirina gelşên bi gumana belkî yên pêşerojê. gelek rîspî û xuyaniyên Bajêr li hevûdu civiyan û di nava xwe de ji bo zewicandina Rêzanî peyivîn. Piştî rabûn êvarekê çûn Dîwanê. da ku mesela zewicandina Rêzanî ji Kurzad Paşa re bibêjin û jê hêvî bikin da rojek berî rojekê zû wî bizewicîne. hêj ku siqûmatek neqewimiye.

Ew Dîwana Paşê ya taybetî. ji bona mêvanên malê. çi alecî çi jî biyanî hertim vekirî bû. Firehiya wê bi sih û sê gavan. dirêjiya wê jî bi sed û yek gavê geredor bû. Raxistina wê hemû bi xalî. xalîçe û kulavên sipî yên bi nexşên keskesor hatibûne dorbandkirin. Li keviya dîwaran berbere hawîdor doşekên tije liba û li ser wan balgîv û nazbalgîvên tije hirê û pirtik li ser êkdu disekin. Li nîvê Dîwanê dikeke grover a weke bejna gazekê bilind ku ji hawîdor ve dihate dîtin disekinî. Mêvanên biyanî û yên

14

xuyanî li ser dikê rûdiniştin. Kesên nas û xelk  
li ser doşekan bi çarmêrkî didanişîn. Li  
aliyekî Dîwanê xwartnêJek hebû, tê de çar Jin  
û deh zilam dişixulîn û hertim niqreyên  
xwarinê li ser êgir sar nedihîşin. Çi dema ku  
mivan diketin hindur, sifra xwarinê li ber wan  
rast dibû û xwarinên pirtexlît Ji ruyên  
mêvanan re dikeniyên.

Ew şev Dîwana Paşê Ji mêvanên biyanî û Ji  
yên nas û dost mişt î qûç bû, şewbêrkê gerr û  
fetil li dora xwe çartew dikirin. Gelek axaftin û  
gotin Ji hin devên xuyanî derdiketin û her kesî  
guhên xwe tapêl kiribûn li xwediyê dangan  
guhdar dibû. Piştî gelek peyv û gotina hin meselok  
û pêkenokan, bîstikekê civat rawestiya,  
da ku bihna xwe berde. Di wê valayiya hayjihevnemayê  
de rispiyekî bi hin awene badayî û  
hinek Jî bi yê rast î dirust berê xwe ber bi  
Paşê ve kir û meselê anî gihande ser zewaca  
xortan. Îcar kalekî din Jî hema yekê nekir didu  
û berê xwerast da Paşê:

- Ya Paşayê comerd. Tu mirovekî bi  
navûdeng î û welatê te Jî xweziya dinyayê ye.  
Kurê te Rêzan heta niha Jî bê zewac maye. Ew  
xortekî pir zîrek, zana û cuwanmerd e; barê pa-  
15  
rastina welêt 11 ser milên wî ye. Niha çaxê  
zewaca wî hatiye û bihurî ye Jî. Xwedêhebîna.

ev çi ma tu wî nazewicîny'?"?

Erê zewac û ne tiştêkî din. Piştî wê gotina bi deng Kurzad Paşa hinekî serê xwe şûtî ber xwe kir û mîna ku li dana bersîveke rewan bigere bîstikê Ji xwe re rawestiya. piştî bersîva xwediyê pirsê da:

- Ez dizanim ku tu çi dibêjî û li çi Jî difikirî.

Lê ez di layê zewaca Rêzanê xwe de gelekî bi tirs im. Ez Jî her mîna te lê difikirim. Lê ez dixwazin ku zilamekî xuyanî yê Jixweşermkirî hebe û keçeke wî ya Jîr î zana Jî hebe ku ez Ji Rêzanê xwe re bixwazim. Ewçax wê Ji mala min re hîn bi xêrdîntir be. Ma ne wisan ye. mamê delal? Piştî wê gotina Paşê. pêleke germ xwe li civatê lefand û ew serobin kir; her kesî guhên xwe lê tapêl kirin, xwestin ku li gor têgihîştina xwe nihêniyeke tûj Ji peyva wî biderxînin.

Hinek Jî çavên xwe li hin qîzebavên nepenî gerandin.

Lê gava Derwêşê mêvan ew gotina Kurzad Paşa seh kir, bi umîda ku wê diyariyeke mezin bidê hema rabû ser nigan û bi dengêkî nermoçkî:

- Paşayê delaL. Min seh kiriye ku keçeke

16

Paşayê Tengavstanê heye. Lê dibêjin ew keçe yeke wisan zana. tîjîfêhm û bi aqil e ku bi tena serê xwe hemû plan û programên bavê xwe dimeşîne. Ez bawer im ku Şîlanê babeta kurê te

ye.

Nav û dengê delalî û çelengiya Şîlana keça  
Paşayê Tengavstanê li dinyayê belav bûbû û  
gelek siltan û serkarên dewletan dixwestin ku  
wê keçê ji xwe re bixwazin. Lê kesî riya xwe lê  
nedidît ku here wê ji xwe re bixwaze. Çimkî  
xwestina Şîlanê ne karekî hêsan bû. Ji ber ku  
ew hem qîza Paşê bû hem di malê de serdarê  
xulam û suxrevanan bû. hem jî rêbaz û seywerê  
leşkeriya bavê xwe bû; timî di nava şêwr û  
qelşên bavê xwe de dîlîpikî û bi endamên  
encûmanê re kar û îşên hêja dikir. Jixwe delalî  
û gewretîya Şîlanê ne karê pişkiftina zar û zimanan  
bû. ku yekî kariba bi devkî bigota. Bedewtiya  
ku Lêbû. li tu keç û zeriyan nebû.

Şîlanê keçeke bejnşoxa noqzirav. lêvtenika  
devgrover û çavkespereke têlbrû bû. Dema ku  
ew dibişirî. kortikeke piçûk diket serê erçena  
wê û hinarokên ruyan xwe dikirin mîna du  
çavkaniyên Sîpanê û evîna xwe bi ser mirov ve  
bi tewra xunavê dibarandin. Dema wê kincên

17

resmî 11bejna zirav dikir û çek diavête milan.  
pê dilên birîndar xweş û şên dibûn û giyana  
hestiyên rizî ji binê axa sar derdikete ser ruyê  
bejê. Jixwe wergirtina wê ya bi kincên pîrekan.  
heywekî tayê bitenê be li vê dinyaya ruhnîk û ji  
bihiştta ademîyan diyarî hatibe ruyê erdê wisan

dilê xemgîn sergeşte dihişt. Şîlanê eynî wek  
mesela gulê. timî bilbilan 11hawîdorê xwe qor  
bi qor kom dikirin. Bi yek dîtineke wê çavên  
kor ruhnî dibûn. dilên murde zîndegiyên  
dibûn. û keser û kovana ji ber tîna rewneqa  
bêhempayê her kesî derdmend dikir.  
Navê Şîlana keça Paşayê Tengavstanê. tîneke  
giran li Kurzad Paşa kir. Ew xwe bi xwe sêwirî  
û di dilê xwe de got: Hêja ye ku ez wê keçê ji  
Rêzanê xwe re bixwazim. Ewçax sêra malbata  
min xirab jî nabe û ez ê hertim jê piştrast bim!  
Lê heýwekî ku Paşê ew dengê Deýwêşê biyanî  
nebiribe xwe. hîç deng nekir. Ê di dilê xwe de  
x1namtiya bi Paşayê Welatê Rojavayê re da avakirin,  
dest bi mirovatiyeke germ kir û hinekî  
pê dilxweş û şad bû.

Ew şev piştî ku şewbêrik bi dawî hat. Kurzad  
Paşa rabû çû 11oda xwe ya xebatê rûnişt. destê  
xwe avêt kaxezekî sor î bi keskî ve. û xameyeke  
18

zergûnî ji xamedankê hilanî, xist navbera  
tiliyên qal û ji Paşayê Tengavstanê re nameyeknivîsî.  
Piştî silav û pirskirina rewş û jiyânê:  
Ya birayê min ê Paşayê Tengavstanê. Min  
bihîztiye ku keça te Şîlanê pir zana yî gewre  
ye. Eynî wisan kurê min Rêzan jî babet û  
hevdemê wê ye. Îcar ez bi vê nameyê li te daxwaza  
mîrovatiyê dikim û kûrê xwe yê mezin



Berhîm xwezgînîdişînim ba te. Eger tu mirovatiya  
min bixwazî11eger keça te û Rêzanê min jî  
bi hev11duqayil bibin, hem bo min rind e hem  
jî bo keça te wê bi xêrdîn bel

Roja din sibe zû Kurzad Paşa rabû haziriya  
hinartina xwezgîniyan kir: bedlek cilê paşatiyê  
li kurê xwe Berhîm kir. Rêzan jî di kincine  
maqûl de werkir û kêlsimeke xweşik da bejn û  
bala wî. Hezar û pêncsed siwarên cengê digel  
çek û rext bi wan re amade kirin. Du hezar  
lokên huşt1ran ji malê dinyayê da barkirin. Du  
hezar cotên hêstiran ji zêr, zîv û ji tiştên giranbiha  
li pey êkdu xistin rêzê. Sê hezar cot axte ji  
xwarin û pêxwarinê bar kirin. Ê berê wan da  
riya bajarê Tengavstanê.

Berhîmê kurê Paşê da pêşiya siwarên cengê û  
hespê xwe ajot. Siwarên cengê li dû wî çarheb  
19

çarheb ketin rêzê, hêstir û deve û axte jî 11pey  
wan kişyan. Rêzan û çend serdarên xwe yê  
leşkerî 11dawiya karwên ajotin û ber bi Welatê  
Rojavayê ve çûn. Ha wisa ajotin û çûn, lê riya  
wan gelekî dûr û dirêj bû. Bê eger deh rojan,  
eger pazdeh rojan, na di roja huvdehan de  
nêzîkayî dan Serbajarê Tengavstanê.

Garis Paşa ew roj derketibû ser Bedena Tengavstanê  
û bi dûrebîna xwe 11hawîdor temaşe  
dikir. Carek ji nişka ve bala xwe dayê ku tîpek

siwar ji jor ve derketin û rast ber bi deriyê  
Bedenê ve hatin. Lê paşayekî bi wergirtine ke  
tekûz 11pêşiya wan e, li dû wî gelek siwarên  
cengê hene, 11pey wan jî karwanê hêstir, huştir  
û axteyan kaşerêz bûye. Garis Paşa li hatina  
hewqas siwar pir fikirî, rind bala xwe da wan,  
piştire xwe bi xwe got: Ne cengek heye ku ew  
têne vir, ew naşûfin bazirganan jî û niha ne  
çaxê geşt û geran e. Gelo ev kî ne û bo çi têne  
vir?

Garis Paşa hey di nava wê xewna xwe ya  
şiyar de 11rê û dirbên bi teşqele sêwirî û çavên  
xwe ji siwaran jî neniqandin, dûrebînê danexist  
ta ku siwar nêzê derî bûn. Hingê wî ji tewr  
û xeysetê wan derxist ku hebin tune bin ew  
20

siwar mêvan in. Lê hema mêvan jî, îcar  
hewqasî pir? Xwe bi xwe got û xweji jorê bera  
jêrê da, çû gazî serkarê xulaman kir, Lê  
qewîUya hazirkirina şîva mêvanan û  
hayjêmana 11hesp û heywanên wan kir, piştire  
jî ber bi mêvanên xwe ve çû û derbasî a11yê  
deýveyê Bedenêbû.

Karwanê xinamtiyê hat 11ber deriyê mezin ê  
Bedenê rawestiya û bû şingêşinga zenguyan,  
siwar tev ji hespên xwe peya bûn. Heçîka  
siwarên cengê tevek şûrên xwe berepêş kirin û  
besterêz sekinîn. Berhîm û Paşayê Tengavstanê

jî b1xêrhatineke 11gor qaydê paşatiyê dane êkdu, piştire jî Berhîm xwe û birayê xwe Rêzan pê da naskirin. Garis Paşa û Berhîm hêdî hêdî meşyan, wî ew û Rêzanî birin 11Dîwana xwe ya taybetî dane rênîştandin û xulaman jî siwarên cengê birin 11mêvanxanê bi cih kirin. Ew şev li Dîwanê Garis Paşa bi Berhîm û Rêzanî re ket nava peyv û galegalan. Lê belê ew 11hatina wan digel hewqase siwar ve hêjî difikirî, gelek disêwirî û hem jî pir diramiya, lê tiştêkî ji ya din bi der vened1xist. Erê: Hezar û pêncsed siwarên cengê, ji bo şer û qalên giran derdikevine riyan û bi welatan ve diçin. Lê

21

hewqas barên hêstiran digel hewqas ên huştiran û ev tiştên wisa giranbiha ku bi xwe re anîne, ne îşê şer û cengan in. Gelo, ev hatine çî û wê ji vir herin kur? di dilê xwe de dubare fikir û ji avjeniya bejê dervediket qada hêsantiyê, hin caran jî xwe di kûrayiya aqil û zîrekiyê ûe serûb:L.ykî dinûqa. Paşê ha \!/\!san hêj keştiya xwe ya têgihandinê ji deryaya xewnexeyalan negihandibû bendera encamê, xulaman sifre hazir kirin û xwarinên curbicur li serê reqaftin dora êkdu. Li Dîwanê Paşe û herdu kurên Paşayê Rojhilatê, ew hezar û pêncsed siwarên cengê jî li mêvanxanê şîv xwarin. Piştire dîsa Garis Paşa bi herdu biran

re ket nava axaftin û xweşbêjan, heta ku çaxê  
raketinê êdî nêz bû. Paşê herdu bira her wisan  
dane xeberdanê û dixwest ku ew şev tişteki ji  
wan fam bike. Lê Berhîm û Rêzan gelekî bi  
sekn û saman, pir bi tixûb û sînor dipeyvîn û  
di xeberdana xwe de tişteki pê nedane çoqandin  
ku ango ew bo çi hatine wir.

Derengiya şevê êdî ne hindik blhurîbû, ew jî  
bi mêvanan re bûbû mêvan û dema  
pêşkêşkirina nameya mirovatiyê hatibû serbiserê.  
Berhîm dizaniya ku mazûrvan jî pir

22

bêsekan e Ê dixwazeku zû pêhatina wan bizanibe.  
Hêdîka ew name ji berîka xwe deranî û  
dirêjî destên Paşê kir. Dema Garis Paşa  
nameya devgirtî vekir û reşbelekiya wê xwend.  
êdî hemû şeverêş. raman û sêwrên neçak Lê  
ruhn bûn. tev bi derbekê li sêr serê wî xweşçak  
û rindhal bûn. şev Lêxweş û hêsan geriya û êdî  
eşkere têgiha ku hewqas siwar tev xwezgîniyên  
keça wî ne. Hinbihin dilê wî yê neseq1rî kete  
kûrayiya cihê xwe û ji wan ramanên têkel bi  
şûnde vekişiya. xwe yeklemkir. Bêguman kêfa  
wî pir ji wê nameyê û ji hatina hewqas  
xwezgîniyê hat: Jixwe ez jî li yekî mîna Kurzad  
Paşayê ROjhilatê digeriyam. ku Şîlana xwe  
bidim kurê wi... Xwebi xwe got û di dilê xwe de  
dubare kir.

Berî ku Garis Paşa tiştêkî bibêje. bi wê daxwaza bo mirovatiya ku ji Kurzad Paşayê Rojhilatê hatibû di dilê xwe de sêwr û arezûne xweş ên bêsinor damezirandin; di dilê xwe de gelek rê û dirb bo tîcareteke nûjen avakirin û haziriya vegirtina hin welatên nû kir. per û baskên xwe bi ser welat û şaristanan ve weşandin. Hemjî nexşineya Rojhilatê anî ber çavên xwe. riyên leşkerî ku pê ve here rapêşî hişê xwe 23

kirin. Lê hin caran jî ew îş ka wê jê re xiş bikin yan nekin dud111yekê ew bi qîmê hingavt. De çî dibe bila bibe. mirovatiya bi Paşayekî wisan bi navûdeng re bo xwe şan û şerefeke mezin hesaband. Û nameya mirovatiyê çend caran hilanî danî ser serê xwe û li lêvên xwe hesikanûin. Piştî destûr ji herdu bira xwest û rabû çû bi jina xwe şewirî. Lê jina wî ya Îngilîzî Marîa Xatûn hîn jê bêtir kêfa xwe anî û razîbûna xwe bo mirovatiya bi Kurzad Paşa re nikaribû binixumîne. Piştî ku Paşê raya jina xwe bi erênî jî stend. gotê:

- Nexwe rabe Şîlanê spehî biedilîne û wê bişîne eywana pîrekan. Bila lawik jî bête wir. Eger dilê wan hevûdu girt û êkdu ecibandin. ji xwe ez ê bersîfa erêbûnê bidin Berhîm Paşa. Marîa xatûn. ji ber ku xortekî Kurd dê bibûna zavê wê. di derengiya wê şevê de pir kêf

û sefa kir û rabû xatir ji xewa şêrîn xwest. Tu nabêjî wê hêj ji dema ku li mala bavê xwe qîz bû. camêrî û dilovaniya Kurdan blhîzt1bû û rind ew dinasîn ku zilamên Kurd pir girêdayê bi jin û zarûkên xwe ve ne û sazûmana malbatî li cem wan pir girîng e hem jî zahf pîroz e. Ji ber wê kêfa xatûnê ya zêde êdî lotik ji hevûdu 24

sist nekirin, nýgên wê erd ranegirt1n û bi helebezeke sivik rabû çû mizgînî da Şîlana xwe. Lê pa jixwe îcar gava ku Şîlanê jî ew mizgîna xweş seh kir, deriyekî nû di bihişta dilan de jê re vebû; ew xewn û xiyalên digel salên hewqasî dirêj tev lê rasterê geriyar, kam û mirazên wê gihane bêxûbiyê û rabû bi lez û bez çû oda xwe; dolaba ferfûrî ya toqalmast vekir, kincine spehî derxistin û li bejn û bala xwe lefandin, dû re çû li ber neynikê rawestiya têt û têtîmar dane xwe; lêv û hinarokên şimamokî bi dermanê ji boyaxa qalikê gûzan xweştî k1rtn. Piştî da kêleka Xatîka Medê û bi meşwerdekî çû li eywana pîrekan rûniştin, çavrêniya hatina dildarê dilê xam ê şeqvîn kir. Lê gelekî bê sebr û semax Şîlanê her li derî dinerî, ka di hatinê de dildar xortekî hêjayê kêlsima wê ya narîn e yan na, qenlm rind lê binere. Herdu bira bi tena serê xwe li Dîwanê ketibûn nava xewn û ramanên bo bersîveke

erênabûnê û di şûna xwe de her dih1nzirîn. Her  
yekê wan bi çar çavên fireh li vegera Paşê  
dinerî û Paşê jî ne hindik dereng mabû. Ha  
wisan ew hêj di nava kûrayiya erênayan de  
loqgurî dikirin, carekê bala xwe danê ku  
25

jineke navsere gavên xwe bêpêjn avêtin hindur  
û şevxweşiyê da li wan. Herdu bira hindik  
silikîn, ji xwe re şaş man û hîn bêtir heyirîn.  
Lê ew heyr û matmayîna wan pêre pêre xwe guharte  
ser xweşî û şaneşîntîyeke bi dilviyan. Bi  
gotina Fermo, Rêzan de rabe were, xortê  
evîndar ji cîhê AWe tîşî jorê bû û rabû da pey  
Xatîka Medê çû eywana pîrekan, li qarişî  
zeriya kezîzer a noqzirav rûnişt û berê xwe da  
ser bejn û bala zirav a bi kêlsima lewendî.  
Belam toreya nijadî hin caran û li hin deveran  
mirov fedîkar jî derdixîne. Ji hinekan  
weye ku mirov paşverû ye û ne sosyal e, yan jî  
axaftina wisan li xweşê hin kesan rewa tê dîtîn  
û timî tê dubarekirin. Ji ber ku Rêzan hey fedî  
dikir ku wisan ziloq li nava çavên Şîlanê  
binere û hin caran serê xwe li pêşberî wê  
şimamoka dilaweran bejîrê erdê dikir.  
Tu nabêjî ew livak û tewra Rêzanî, hîç li  
xweşê Xatîka Medê û ya Şîlanê nediçû. Lê  
Xatîka Medê hêdî hêdî Rêzanê çavreş da xebirdanê  
û hin gotin ji hin deverên cihê cihê anîne

ba êkdû, bi xweşbêjan ve ristegovendiyeke payedar  
afirand. da qenim zû meşka fihêUya xortê  
dildar ê li pêşberî zeriya kezîzera a çavhzalal

26

bide dirrandin.

Piştî rakirina wê firtona Medê ya di mabeyna  
çiyayekî qeşemê û yekî êtûnî de, herdu  
dildar hûrik hûrik bi hevûdu re ketin nava  
peyv û bêjeyan, 11hev geş û xweş bûn û sikra  
xerîbiyê hilweşandin.

Demeke ne dirêj bihurî, Ji nedî ve derî vebû û  
xatûnek hate cem Rêzan û Şîlanê. Lê pa çi  
xatûnl Xatûn hêj Ji zeriye delalUr û naziktir  
bû: ruyekî geş Lêbû, qey yekî digot ava Kaniya  
Laleş e. Porekî kej î gûnesmer li serê wê bû ku  
her têlek mtnabû şivtên Alaya Rengîn. Jixwe  
lêvên wê yên tenik ên şanikî mî nabûn  
qeysiyên Meletê. Ji delaliya wê re hema yek ne  
dikaribû bixwe ne Jî vexwe û timî rûne li bejn û  
bala narîn binere. Bi hatina xatûnê re. Şîlanê  
û Medê herdu rabûne ser ntgah û cihên xweJê  
re vala hiştin. Lê Marîayê ew bergeşa li ser  
destên xwe ya tije şiranî bir 11ber Rêzanê  
çavbelek danî ser maseyeke piçûk û  
xêrhatineke xweş lê da. Hingê Rêzan dirûfê wê  
Ji yê Şîlanê derxist, ku ya dê bibe xesuya wî ev  
bi xweye. Îcar ewJî Ji şûna xwe rabû û çû destê  
wê maçî kir. Piştire Maria Jî tevî civata zerî û



bengiyê zeriya xwe bû û tevan bi hev re xwe li  
27

xeberdana şevê şidandin.

Ew şewbêrika xweş. li eywana pîrekan  
domand. Lehiya pêlên evînê xwe bera ser deryaya  
dilan da. keç û xort hay ji rêveçûna şeva  
şênîk neman ka çiqas şev bihuriye yan hêj zû  
ye. Di wê navê re Medê hema carekê ji nedî ve  
wenda bû. Tu nabêî ew cûve ku mizaînê bide -J " ~ \_  
Paşê. bêje: Erê, hewar rast e, xêr bi xweşî ye û  
tu gelş û asteng demeketin holê. Bi tewrekî  
wisan badayî bi Paşê da zanîn ku Berhîm tu  
tişt jê nefamî û dîsanê şûnde vegeriyaçû.  
Ji wê mizgîna pîroz re, herdu lêvên Garis  
Paşa gazek ji êkdu vekişyan, bi dilekî xweş û  
şadan destên xwe avêtin qurmê simbêla û  
herdu alî badan. Dû re jî berê xweda Berhîm:  
- Mirovatiya bi bavê te re, bo min şerefeke  
mezin e. Daxwazawî li ser ser û çavên min.  
Piştî herêkirina Şilanê ji kurê Paşayê Welatê  
Rojhilatê re, şadîmaniyeye şên kete Serbajarê  
Tengavstanê. Sibe zû leşkerên bando bi saz û  
awazên qaydexweşrêzbeste bûn û awane curbicur  
lê xistin. Dengbêjêntaybetî yê leşkeriyê bi  
nikline awecihê stiran û helbest gotin. Zerî û  
cariyeyên Serayê tev xwe kirin mîna  
şimamokan û derketin pêşanekê reqs û sema

28

kirin Û govend girtin. Ew şênî û şahîbe bi tîrêjên roja geş re silava xwe gihandin Tengava Tengavstanê. Dû re Paşê haziriya merasimeke taybetî bo nîşankirina keça xwe kir: giregirên serbaz û polîsan digel malxwe û berma11yên xwe hemû besterêz bûn, vebuhtî û berpirsyarên dewletê jî xwe 11hawîdorê wan çardor kirin. Rêzan û Şîlanê bi êkdu ve milbestekirî hatin meydana DUXweşiyêû bi pêplûkan ve havrazî ser kursiyên axaftinê bûn. Ha wisan ew şahî û şîranî heft roj digel şevên xwe domandin. Piştî jî Berhîm û Garis Paşa di navbera xwe de çaxê veguhaztina bûkê kifş kirin. Îcar Berhîm û siwarên xwe yên cengê rabûn xweji rêwîtiya Serbajarê Rojhilatê re hazir kirin. Berhîm û Rêzan xatir ji Paşê xwestin û di banga beyana wê roja xweş de ji Tengavstanê derketin rê û ajotin çûn Welatê Serbajarê Rojhilatê. Garis Paşa bi wê mirovatiya bi Paşayê Welatê Rojhilatê re, gihabû baweriyeye wisan tîr ku nema êdî ji Rojhilatê ve çu talûke bi ser welatê wî ve tî. Û çî dema ku lê biqewimeyan serê wî bikeve teşqelene giran, dê zavê wî Rêzan bi hewara wî ve bê û Kurdzad Paşa jî di 29

raya giştî ya dinyayê de bo wî bibe alîkar. Piştî çûna xwezgîniyan ji Tengavs1tanê çend roj şûnde Garis Paşa hemû serok û berpirsyarên

xwe yê leşkerî civandin û 11 ser  
nexşîneya Rojhilatê paln û qolanine nû xazerêz  
kirin. Lê belê Gêris hey çavên xwe 11 darên  
xurma mûç dik1rtn û hin awir jî ta bi gurc1yên  
Gurcistanê digihandin.

Jixwe daxwazeke sazûmana Tengavstanê li  
ser axa Anatoliyayê hebû. Tixûbê ku demekê  
gihabû Qeyseriya Romanî. beýjêr şimitîbû û  
çûbû ta bi nêzî Tengavê rawestiyabû. Di salên  
kevnare de gelek şerên dijwan di navbera Serbajarê  
Rojavayê û Serbajarê Rojhilatê de  
çêbûbûn. Di wan şer û qaleyên giran de geh Rojavayîyan  
tixûbê xwe hevraz dehf dabûn û ber  
bi Navruwa Rojhilatê ve çûbûn. gahî Rojhilatîyan  
tixûbê xwe beýjêr dehf dabûn û ber bi  
nêzîkayîya Tengavê ve şem1tandibûn. Lê ew bi  
qederê sedsalekê dem bihurîbû ku di navbera  
herdu aliyan de çu şer demeket1bûn holê û  
siqûmat1ne kirêt nec1r1yabûn. tixûbê di navbera  
wan de ji cihê xwe neleqiyabû. Îcar bi dana  
wê keçê. herdu alî jî umîdeke pir mezin dikirin  
ku êdî ji wê gavê û şûnde wê li şûna şer û  
30

şematê germiya mirovatiyê giraniya xwe  
derxîne holê û destûra bûyerine mîna yê  
kevin nede.

Piştî rêwîtiya bi du heftîyan, Serbajarê Rashilatê  
mizgîna vegera xwezgîniyan a ji Bajarê

Tengavstanê hilda û defa şahiyê xwe 11ber Seraya Dewletêgurgurand. Berhîn gava ji hespê xwe peya bû, bi pêplûkan ve hilkişiya çû derkete banî û destê bavê xwe maçî kir:

- Bavo. Mebûka xwe nîşan kir. Min û Garis Paşa di navbera xwe de biryar da, ku em ê di bîst û yekê adarê de bûka xweveguhêzin.

- Lawêmin, de bila bi xêr û xêrdîn be.

31

- n-

Serbajarê RojhUatê xwe ji daweteke bêhempa re hazir dikir. Kêf û şahîne wisan zêde ketibûn nava xelkê, ku li tu deveran nedihatî dîtî û heta wê gavê jî ne hatibû ne bihîztî, ne jî kes dikaribû salixê wê bide. Xelkê mizgînî gihande êkdu, pêrozî li hev dan û mîna col û bi colan ber bi Seraya Dewletê ve çûn. Kurzad Paşa jî xwençe li xelkê belav kir û daxwaz kir ku her kes bi hûr û giran ve bê daweta kurê wî. Du meh berî bîst û yekê adarê li her kuçe û kolaneke Bajêr deng bi def û zirnê ket, govendê gerr vedan, bû şahî û şehwar. Di her maleke bajarvaniyan de kêf û geşta wê roja bi nav û nîşan xwe bi cih kir. Alaya rengîn li ser banê hemû xaniyan hate çikandin. Bûk û qîzên Bajêr xwe bi kincên keskesor ve xemUandin. Ger li mey-

32

dana liber Serayê be, hem li nava sûkê jî keç û

xortên bajêr milbestekirî û qor bi qor digel  
şagirdên xwendegeh û dibistanan ve geredor  
bûn. Ji hawîdorê welêt, bi dehhezaran siwarên  
çê hatin Serbajarê şên û li meydana colanê  
hespên xweji bo riya Tengavstanê ceribandin.  
Ji nava wan hespan bîst û pênc hezar hebên  
bijare hatin niqandin. Hewqas jî siwarên  
cengê ji bo anîna bûkê amade bûn. Piştî  
Kurzad Paşa deh hezar hêstir ji xwarin û vexwarinê  
bar kirin. Dozdeh hezar jî axte ji  
cihêzên Bûkê... Berî roja Newrozê bi bîst rojan  
wek cara berê, dîsa Berhîm kete pêşiya siwaran  
û berê xwedan rê, çûn bajarê Tengavstanê.  
Bajarê Tengavstanê jî ji bo roja bîst û yekê  
adarê ku Şllana xwe virêdikir, dest bi haziriya  
şahiyeke bi şaneşîn kiribû. Her roj keç û cariyeyên  
Seraya Garis Paşa li keviya Tengavê bi  
xortan re cergebazî dikirin û Şllana Paşê li  
kuçe û kolanan gerandin, mîna ku xatirê wê ji  
hemwelatiyan didane xwestin, mal bi mal  
rojbaşî da xelkê heta roja ku dawetvanî gihane  
wir.

Pêncî hezar siwarên Serbajarê Rojhilatê  
gava xwe bera nav Serbajarê Rojavayê dan,

33

rast çûn li ber Seraya Garis Paşa sekinîn û ji  
hespên xwe peya bûn. dest bi reqs û dilanê  
kirin: govenda sêpê leyiztin. stiran û dîlokên bi

zimanê xwe gotin. Ew roj wan li wir Newroza  
xwe jî pîroz kir û bûyera Newrozêji xelkê bajêr  
re gotin. ku: Dehakê Ereb timî xwîna xortên  
c1ndî yên Kurd vediX'wvarû mL"Cê \Va..T1 jî bi herdu  
marên xwe didane xwarin. Lê rojekê Kawayê  
Hesinker daqmoqê xwe hilanî û çû li nivê  
şUika serê wî xist. mejî lê kir mîna dew û xelkê  
xweji binê sazûmana wî rizgar kir! Ha ew roj û  
ev roj. bîst û yekê meha adarê bûye cejneke  
pêraz a neteweyî. Îcar bi wê sêwr û ramanê ye  
ku roja gihandina azadiyê her sal bi şax û  
şoxeke bêhempa ji aliyê Kurdanve tê  
pîrozkirin ...

Garis Paşa nehişt ku dawetvaniyên wî ew  
xwarinên bi xwe re anîbûn. çêbikin. Wî ew roj  
ji kîsî xwe du hezar conega. sê hezar beran. çar  
hezar berx. pênc hezar kavir dane seyjêkirin û  
digel birinca Çînê ji wan re kirin şîv. Piştî  
xwarina şîvê, îcar fêkiyên curbicur danîne ber  
dawetvaniyan û bû noşenoşa bi peyale û  
îskanên bade û meya hingûr... Bi wê tewr  
tevgerê şemla şevê giha seretaya evîneke  
34

bihiştî. Li aliyê din jî keç û zeriyan dest bi hinekirina  
dest û zendên Şîlana kezîzer kirin û  
reqsebazîyan xwe li êkdu rapêş hingavtin.  
Di wê şahî û şevxweşiyê de, bala hinek  
serdarên leşkerî yên Kuý'Zad Paşa kete ser wê

ava Tengava Tengavstanê û li Deýyaya Mimíyyê  
çavan zUoq kirin. Dilê wan pir bijiya wê  
ax, Deýya û Tengavê. Ji ber hindê êşeke giran  
dUê hemuyan hingavt û avşûtik ji devê serdaran  
daweribî, cerg ariyan û di dUêxwe de berfirehkirina  
tixûbê xwe ta bi wê deverê gihandin  
serbiserê. Berhîm jî ew şev ne hindik tengijîbû  
û hema serî Lêdox dibû. Hin caran bi henek û  
qtrf, yekcaran jî ji dilê safî: Gereke em timî li  
vir goştê masiyan bixwin, di hinavê xwe de  
disêwirand. Lewra di demekê de tixûbê qedîm li  
vir bûye, xwe bi xwe digot û dibUand...  
Sibehê zû dawetvanî rabûn bûka xwe li  
hespekî nêr siwar kirin, da ku berê bûkê yê  
pêşî nêr çêbibe û bi rê ketin. Lê pa hespê di binê  
bûkê de! mala xwediyê wî ava be, hema nebêje  
hesp bêje filek bû û di şûfê şêran de afirîbû.  
Çaxê bûk lê siwar bû, pîrozê delal hema dêla  
xwe hUda jorê û serê xwe tîk bilind kir. Li pêş  
û paşê bûkê heýwekî du çeper çêbûbin ew xist  
35

mabeyna du tabiyan, zînê di binê wê de jî  
hindik dakete jêrê û bi firefir ber bi aliyê derketina  
rojê ve beziya. Deh hezar siwarên Garis  
Paşa bi zeyiya xwe re hevrêber bûn. Paşe jî bi  
peyatî li pêşiya wan qederek meşiya ta ku ew ji  
deriyê Bedenê bihurînadin. Li wir gava Berhîm  
xatir ji Paşê x-west, Paşê got:

- Birazî. Hûnê sê roj herin bigîjin baxçakî mezin. Ew baxçe yê seyrangeha min e, li wir hîç nesekinin û neçin navê. Hûn ê sê rojên din jî herin, bigîjin baxçakî din. Li wir hûn dikarin bisekinin û herin li navê bihna xwe berdin.

De îcar herin, ji hewe re oxir be.

Siwarên Welatê Rojhilatê dest bi cirîd û colanê kirin û li hawîdorê bûka xwe tûr avêtin: geh kumên êkdu hingavtin û cama jî wek şerê bi rim û mertalan bi hevûdu re leyiztin. Ji her tiştî zêdetir wan dixwest ku hunerê xwe nîşanî siwarên Garis Paşa bidin. Lê siwarên Gêris hîç têkilî leyztika wan nebûn û bi rengê parastina dawetvaniyan hespên xwe bi rêzbeste ajotin ta ku ji Bajêr dûr bûn. Ha wisan ew hêdî hêdî bi dawetvaniyan re meşiyên heta ku gihane Çiyarêzên Belik û li wir xatir xwestin, tev bi şûnde vegehiyan çûn Bajarê xwe. Dawetvanî jî

36  
li riya xwe sê roj domandin, gihane baxçê seyrangeha Paşê.

Berhîm li pêşiya siwaran bû, bala xwe dayê ku baxçe hema baxçe ye. Xwedê mala xwediye baxçe ava bike: hawîdor bi dîwarekî qalind î bilind mîna yê sûran dorgirtî ye. Dîwar weke dirêjiya sê bejnan bilind û bejneke jî fireh bû: bi kevirên berezî hatibû lêkirin. Deriyekî derge yê ji pola li ber bû, her aliyekî wî heft gaz



û nîv fireh û sêzde gaz û çarîkek jî bilind bû.  
Serê b1zmarên di herdu aliyên derî de, mîna  
yên şêr û maran tev bi nexş û n1mûşan ve xemilandî  
bûn. Firehiya baxçe bi qonaxa du  
rojan û danekî bû, dirêjayî jî bi qonaxa rojekê  
û sê danan... Piraniya erdê wî deş, aliyek jî  
çiya bû. Ji wan çiyayên bilind ava kanîsarkan  
timî bi co û colan beljêr dibû. Ew av li deştê digihane  
ser hevûdu û xwe kiribûn çemekî mezin,  
mîna xaçerêzê li hemû qozî û qewêran dormedar  
dibû. Bend û benda çem darên selwa  
hllk1şabûne ber perên ewran û timî bayê hênik  
xwe di mabeynê re dihejan. Nava baxçe heçîka  
deverên rast. tev bi darên fêkî hatibû xemilandin.  
Li binê wan, giyayên rengareng serî  
hildabûn û ji nava xwe çîçekên keskesor der-  
37

xistibûn jorê. Peyariyên li navê gazeke fireh  
bûn û bi kevirên mermer dikişiyane ser  
hevûdu. Li kêlekên wan bi her du-sê sedan li  
deverekê kursîne bo rûniştinê xwe ji mirov re  
nîşan didan. Ê guliyên daran çîçek û tahlîkên  
xwe li raserê wa.'l vegLrt!bûn\_ Li deverên heçîka  
gir û çiya qefle bi qefle pezkûvî. xezal û gakûvî  
digeriyan. Jixwe qebeqeba kewên ribat xasma  
di kazîma sibehan zû de gava dev pê dikirin û  
dixwendin, qey yekî digot hema qîr û qiyameta  
Newrozê ye û ez ketime navê. Ferxikên

kîvroşkan timî bi hevûdu re li ser wan peyariyan  
dileyiztin û niçeniç dikirin. Cama jî ew dihatin  
nêz û nigên mirov dadilastin. Were ji vê  
ket û nefela tê de ku diavêtin hetanî digu11yê.  
Were hafa çîweçîwû qideqida hewqas zerzerok.  
şalûl û kotirên li serê dar û zinaran û 11nava  
giyayê ku bi zimanine pirtexlît. bi deng û  
awazên qaydexweşdeng ku bang dikirin...  
Baxçe ji kêf û geştan re devereke pir xweş û  
şên, gelekî rind û delal bû. bihna mirov lê derdiket.  
Gava yek dikete navê. nedixwest ku jê  
derkeve. diviya saldozde mehan li wir bimîne.  
11navê bigere û kêfa xwe dubare bike. Reng û  
ruyê baxçe bi şênî û şadan bû. timî ji mirov re  
38  
dikeniya. herwekî dixwest ku ew bi tenê  
nemîne û bi mirovan re mirovatî û dostî bike.  
Êvar derreg bû. rojê dikir êdî xatirê xwe yê  
rojane ji ax û ava bej û zeryayê bixwaze û riya  
xwe bi ser welatine din ve bixîne. Tenê hin  
tîrêjên xwe 11ser çiyayên bilind hiştibû û kumbeta  
serê wan kiribû mîna taceke zêrîn.  
Tarîtiya şevê jî xwe gihandibû seranserê deştan  
û di newal û geliyan de hîn bêtir dihate xuyakirin.  
Bayê hênik dest pê kiribû û xwe dileqand.  
ber bi firehiya welatan ve tûj diçû.  
Berhîm gava çav bi wî baxçeyê hewqasî xweş  
û şên ket. gema hespê xwe şidand û berê wî

şûnde vegerande ser siwaran:

- Zarûno! Berê xwe bidin nava wî baxçeyî. Em ê îşev bihna xwe 11vir berdî û tê rakevin. sibehê em radibin 11riya xwe didomînin. Berhîm rast ajote nava baxçe û 11dû wî ew pêncî hezar siwar kişyan. çûn 11navê peya bûn. Li wir çadireke taybetî ji bûkê re vegirtin. çadira Berhîm 11kêleka ya wê. Siwarên cengê jî bi rêzê çadirên xwe 11mêrgan vegirtin. Û di nava wî baxçê xweş de ketin zewqû sefayê; kew kuştin. xezal gurandin û 11kêleka çadiran agir dadan. goştê nêçîrê dan bistê û ji xwe re nanê

39  
sêlê çêkirin.

Li nava baxçe zinarekî bilind hebû. di nîvê wî de lemelema kaniyekê bû û aveke gurr ji xwe diavêt deýve. Ew kanî timî ava xwe li qeysekê diavêt. Ava wê gelekî zelal mîna çira şîr bû. pir şêrîn weke çirava hingiv bû. Hin caran rengê xwe li ber tarîtiya şevê diguhart û leylan dida raserî dar û zinarên li dora xwe.

Berhîm bala xwe dayê ku ava wê kaniyê ji ya hemû kaniyên din zelaltir xuyan dike. çû tasek av jê vexwar. Pêre pêre dilê wî xweş bû. rengê wî geş bû û hênikayiya dil û hinavên wî pêl bi pêl b111ndtirbû. Piştî wî ferman da ku her kes ji wê kaniyê av vexweû ji yê din kes venexwe. Ew şev di derengiyê de Terxanê Serdar digel

pêncî û pênc serbazên bijare şûrên xwe girtin û çûn 11ber deriyê delVa nobet girtin. Her ku şev çû. sir û sermayê rûçikên xwe derxistin holê û bayekî gurr li wan rabû. Lê hema ba. çî ba bûl Fîrefir û wirewireke wisan bi tirs jê dihilat. hema digotin qey ga û masî xwe dileqînin û hahaye ku dinyayê serobin bik1n1Bi horîn û borîna bayê re. îcar ewrên li asîman jî dest bi gef û gurrên xwe kirin. qîr û qiyametê lidar xistin. şîrqeşîrq û gurmînî daxistin behr û 40

bejê. Ji ber wê tirs û zelzelêhindik mabû ku ev dinyaya girover ji tirsan vezele û mîna Deştî Mûşê xwe pahn bike. Piştî îcar baranê tolaziya xwe nîşanda. Aveke gurr ji ezmên daweribî û pê re jî mij û moraneke kor qadê vegirt. Piştî rawestina baranê. digel colana mijê îcar teyrokê şevbaşîya xwe gihande ser baxçeyê şên. Hinek şûnde jî berf barî. Ha wisan bi qederê saetekê dinya bû şibtê Tofana Nûh Pêxemberê Cûdî: lehî rabû û dar û ber bi xwe re kaşerêz kirin. newal û mesîl tev mişt bûn û eynî weke deryaya Wanê av li dora hevdûdu geremolbû. Piştî wê tofildûmana bi sosret. hinbihin bergê asîman vebû: ewrên bi xezeb firrikîn û dinya bû çîk sayî. Îcar Terxan û peyayên xweçî bibînîn baş el Dîna xwe danê ku ziyayekî maran xwe li ser sûra baxçe hawîdor kiriye.

dûvê xwe daniye ser sivdera derî. xwe li dorê fitilandiye  
û serê xwe aniye daniye ser dûvê xwe.

hema ziloq li wan dinere. Ew hinekî ber pê ve  
çûn û lê nerîn. Ziya. mîna evîndarê ku çav bi  
evîna xwe bikeve hema ziloq bû û tûj li nava  
çavên Terxanê Serdar nerî. Terxanê Serdar û  
hevalên xwe ji tirsawî Ziyayê kesnedîtî  
behitîn û ji devgerê ketin. Lê wek mesela ku  
41

dibêjin. xêra tirsê ji mirinê re çênabe. şûrê xwe  
kişand û êrîşê wî kirin. Ziya hema devê xwe  
vekir û pifê wan kir. Çewa ku newaleke fireh li  
ber wan vebe. bayekî gurr ji devê wî derket û ew  
tev li berê çûn. her yekê wan bîst teqle li ser  
hevûdu avêtin û bi erdê ve xwtş1kîn. Bîstikekê  
şûnde Ziyayê devê xwe girt. ba jî sekinî û ew li  
cihê xwe aman. Terxan rabûn ser nýgan. şûnde  
f1ti1în hate nêz û li Ziya nerîn. Ziya jî hema  
devê xwe jê re vekir û girt. mîna ku gef lê bixwe  
ew tirsand. Îcar Terxanî çî bibîne baş e. Dît ku  
di her aliyekî devê wî de sêsed û şêst û pênc  
diran hene; her diranek jî sih û pênc gaz dirêj e  
û di şkefta devê wî de mîna pozê çiyayên tûj  
wisan bi rêzê hin newal û gir hene ku nayêtin  
jimarê. Lê jixwe derziya ku di serê zimanê wî  
de ye. mîna şîşa brûskê tûj û dirêj e û lemelema  
guriya êgir ji devê wî dibare. Terxan ji hêbeta  
wî tebayê mexof tirsîya û di şûna xwe de

şemlrîn. Di wê navê re bîstikek bihurî. dîsa  
Terxanê Serdar nav li xwe da û şûrê xwe hejand  
kir ku êrîşê Ziya bike. Lê Ziya vê carê hat xeberdanê  
û bi zimanekî nerm got:

- Terxan. Tu yê çî biký"?"

- Ez ê te bikujim.

42

- Tu nikarî min bikujî. Binêr te bi pifeke  
min hewqas teqle avêtin. Lê eger ez vê carê  
hilma xwe bikşînim, ewçax tu û heywanên xwe  
digel tiştên we tev, bi dar û berên vî baxçeyî ve  
dê bikevin nava min û we tevekan dadiqurtînim.  
Vê yekê rind zanibe, kuştina min ne  
karekî hêsan e û tu xwedîgiyan jî nikarin min  
bikujin. Lê ez ê tiştêkî ji te re bêjim: Derdekî  
min heye. Ew derdê min pir giran e, bê derman  
e û dermanê wî nîne. Ez, ji bo çareserkirina wî  
derdê xwe ye ku îşev hatime vîrl Jixwe tu tenê  
bi serê xwe nikarî bersîva min bidî. Îcar  
bişîne pey Rêzanê Paşê bila ew bi xwe bête vir,  
çend gotinên min jê re hene ez ê bêjim.

- Kaji min re bêje.

- Naaal Heya ku Rêzan neyê vir, hûn yek ji  
nava baxçe dernakevin der.

Terxanê Serdar çû wê meslê gote Berhîm.

Berhîm gava hate ber derî û çav bi wî Ziyayî

ket, jixwe herdu çokên wî qurifin û ji tirsan

nema êdî karibû xwe li ser nigan ragire. Piştire

bala xwe danê ku tu çare nîne, destûr ji Ziya stendin ku siwarek ji nava baxçe derkeve û here Serbajarê Rojhilatê, da xeberê bide Rêzanê zave.

43

Wê şevê zilamek li hespê xwe siwar bû û berê xwe da Serbajarê Rojhilatê. Serbajêr jî bo şahiya anîna bûkê xwe xemilandibû; li her alî govend û dîlan dihatin kirin û qîr û qîyameta Seraya Kuý'ZadPaşa gihabû asîmanê banî. Gava xelk çav bi siwarê qasid ket, ji wan weye ku bûk jî li pey wî tê û dest bi kêfê hîn germtir kirin. Lê siwar bêmade bû, rûçikên wî kirî bûn û diponijî. Dema wî meselê got Rêzanî û Rêzan hema bê his û pis çû kincên şer li xwe kirin, şûrê xwe hilda û 11hespê xwe siwar bû berê xwe da rê ber bi Rojavayêve çû, her kes têgiha ku siqûmateke mezin li dawetvaniyan qewimiye. Bi derbekê ew kêf û Şahiya dawetê xwe bi şîn û reşiyê ve bermeqlûb kirin. Her kes di şûna xwe de sar ma û şemirî. dawet rawestiya û Serayê Alaya rengîn daxiste nêvî.

Rêzan Çaloyê xwe digel beza bayê ajot. Rê û dirb xwe li ber Çalo nedigirtin; newal û gelî 11 berê dibûn mîna kort û mesîl, çiya û deşt dibûn fena kuçe û kolan. Ha bi wê bez û colanê Rêzan roja din êvarê xwe gihande baxçe û li ber derî pêrgê Ziya bû. Dema Ziya ew dît pir kêfa xwe

anî, bi peyvîne devlikenpê re hat xeberdanê:

- Rêzan. Eger tu derdê min derman bikî, ez ê

44

xwe ji dora baxçe bidim alî. da ku mîletê te derkeve û bûkê bibin. Lê eger tu nekî. ez kitik îro ji we sax nahêlim.

- Derdê te çi ye?

- Tu yê herî Şûrê Qoloyê Mirîxwir ji min re bînî.

- Eger tu nikaribî şûrê wî ji xwe re bînî. ma ez ê çewa karibim herim ji te re bînim? Jixwe ez nizanim Qoloyê Mirîxwir li kur ejî!

- Erêêê. erê Rêzan! Eger tu bidî xwe. tu dikarî herî bînî. Ne beredayî ye ku ji te ere gotine: Fetha dinyayê li ser destên Rêzanê kurê Kuý-zad Paşayê Rojhilatê çêdibe! Di dinyayê de ji te pê ve. wekî din tu kes nikare here wî şûrî ji min re bîne. Rêzan eger tu herî çi bê serê te. ez ê ji Terxanê Serdarê te re bêjim. Û heta roja ku tu werî jî. xwarina xelkê te her roj li min. Ji êm û alifê heywanan re jî çi lazim bibe. li min. Û çi roja ku tu li wan deran Xwedê neke eger bêtî kuştin. ez ê xwe ji ser dora baxçe bidim alî. bila xelkê te bi riya xwe ve here.

Rêzanê ku hêj hina zava tiyê bi destan ve ter bû xwe bi xwe sêwirî. lê tu çare nedît. Piştî gote Ziya:

- Soz û bext?



45

- Erê. Rêzan, bi bext û soz.

- De ka bêje. Tu yê çî jê biký'?"

- Rêzan. Ez niha ji te re nabêjim. Lê gava bi xêr û xweşî te şûr anî hingê ez dê ji te re bibêjim. Tenê ez niha vê yekê karîm bêjim ku, ez xwe tawanbar dibînim û dixwazimji binê wî gunehê giran biftlitim.

Rêzan li pêşberî wê daxwaza Ziyayê merd bêgav ma; yan wê biçûna jê re şûrê Qoloyê Mirîxwirbianiya, yan jî di wê şevê de ew tev dê bibûna êmê wî. Lê Rêzanê zava biryara xwe da ku here şûr bîne û bi çî siqûmatên giran dibe mal bila bibe jî, da xelkê xwe ji wê tengasiyê xilas bike. Rêzan li wê hina ter a li destên xwe nefikirî, li bûka serbixêlî nesêwirî û xwe ji çûna bo anîna şûr re amade kir.

Rêzanê zava ji ber dilovanî, mirovperwerî û dilzîzbûna xwe, tu caran nedixwest ku serê kesî biêşe yan hinek derdmend û xemnak bibin. Wî hertim gelşên xelkê xwe çareser dikir, ji bavê xwe zêdetir xwe berpirsyarê hemû hemwelatîyan didît. Çî daxwaz û pêdiviyên welatê bavê wî hebûna, pêşî ew dikete suxrê û bi şev û rojan dişixulî. Jixwe parastina jiyana pêncî hezar siwarên dawetva'yû, ji qulçavka dilê xwe bêtir

46

pêwîstiya parastinê bo xwe berpirsariyeke

girîng didît. Ha Ji ber wê yekê Rêzan dizanibû  
ku ew riya wê pê ve here ya çûn û nehatinê ye  
Jî, lê ew li çûnê bi vegeza ihtîmala belkî bûna  
Jî xwe hazir kir. Rêzan dû re çû binê çadira  
kekê xwe Berhîm:

- Va ez diçim riyeke pir dûr, ya çûn û nehatinê.  
Eger ez hatim Jixwe rind e, Lêeger ez nehatim,  
tu Şîlanê li Terxanê Serdar mehr bike.

Hema hesêbî ew, di şûna min de birayekî we  
ye.

Berhîm û Terxan kesî bi çûna Rêzan a Ji bo  
anîna şûrê Qoloyê Mirîxwir nehisandin. Li  
nava baxçe her kes di kêf û sefa xwe de bû û  
govend lidarketî her seredor dibû; qîr û şemata  
govendgêriyan li taht û zinaran dengvedêr  
dibû. Rêzan bêdeng rabû xatir Ji kekê xwe  
Berhîm û Terxanê Serdar xwest û derket çû  
binê çadira Şîlanê, bixêrhatineke melûl da wê  
Jî û mesela çûna xwe gotê. Piştire li Çalo siwar  
bû, berê xwe da rê û terkesrî dinyayê bû, li riya  
nenas ajot û çû. Di derketina Ji deriyê baxçe de,  
Ziya deng lê kir:

- Wa Rêzan. Tu yê herî, herî û herî heta ku  
digîjîperê dinyayê. Li wir çiyayekî mezin heye.

47

Min seh k1rtye ku Qoloyê M1rîxwir di şkefteke  
li wir de dijî. Lê pir hay ji xwe hebe, ew peyayekî  
pir bêbext e û ji mala bê bextan el Ji xelkê

xwe re jî bêje, bila timî ava kaniya Zinêr  
vexwin. Mirov bi vexwarina wê ne pîr dibe û  
temenê jî pê dirêj dibin. De here îcar oxir û  
felekên te yê xêrê bin. Lê ha tu vê jî jibîr  
meke; dibe ku tu deh salan şûnde vejerî, dibe  
ku bîst salî şûnde... Her çiqasî tu dê pir zor û  
zehmetî bibînî jî, lê li wê gorê hewqas tu yê kêf  
û xweşî jî bibînî.

48

-m-

Rêzan serê hespê xwe berda rê, zengû Lê  
nîçandin, bi çargavî ew ajot û çû. Îcar wek  
mesela ku di çîrokan de dibêjin: Çoy û çolistan,  
berrî û berristan, havîn çû ma zivistan, serê  
Rêzanê kurê Kurzad Paşayê Rojhilatê hê ji nû  
ve kete nava şeq û deqên bi xax û giran. Rêzan  
hespê xwe ajot û bi çîyan ve çû, li newal û geliyan  
rast hat, li deştan qelibî, kincên wî  
peritin, hêsîr û evdal bû, pekûk û reben bû, di  
riyan de birçî ma, giya û pincara çolê xwar,  
jahrî kete girara wî û ji xwe re li dinyayê  
geriya... Bi şevan, bi rojan hespê xwe her ajot,  
çû û hey çû. Ha wisan bi wê gerrê, bi wan fetl û  
dewran heft salên Rêzan kuta bûn, di sala  
heştan de rojekê derket serê çiyayekî bilind ku  
nîvê dinyayê jê ve xuya dikir. Wî kir ku xwe

49

bera aliyê pişta çiyê bide, carek bala xwe dayê

ku êdî weş di hespê wî de nemaye û xwe li ser rugan ranagire. Ew bêgavma û peya bû. Lê îcar çi bibîne; nerî ku her çar simên çalo mihiyane û goştê sor derketiye derva. Hesp wisan bêxêr û qels bûye ku weş tê de nemane. Rêzan xwe bi xwe got: Ez hespê xwe bikujim çênabe, ez wî li vir bihêlim û herim jî hîç nabe. Lê eger bar û piştî be jî, hema hedana min pê tê bes e. Hesêbî çalo hevaleyê e û bi min re têt Rêzan hespê xwe destkêş kir û berê xwe bejêr da, ji çiyê datek xwarê.

Ew riya ne rê ya ku Rêzan tê re ber bi welatekî din ve diçû, hem jî welatekî biyanî yê ku li piştta çiyayên dormadorê dinyayê dima, herweha ku wî ne derek dinasî ne jî riyeye hêsan dizanibû, ajot û rast çû. Xwebember bejê berda û Çalo li dû xwe destkêş kir, çû giha ser kaniyekê. Li wir hespê xweberda mêrgê û wî jî ji xwe re hinek pincar çinî, bir li ser kaniyê şûşt û xwar. Piştî jî serê xwe danî erdê bihnekê raket.

Rêzan dema ji xewşiyar bû, çû bi gema hespê xwe girt û berê xwe çolebir da neriyên. Ew hinekî çû, carek dîna xwe dayê ku wa tebayekî

50

nola girekî mezin û bilind li ber deriyê şeftekê rûniştîye û hema nav li xwe dide. xwe bi xwe dibêje: Waaah! Ez heme. ez Qoloyê

Mirîxwir im. Fetha dinyayê li ser destên min  
çêdibû. Min di bîstikekê de Rojhilat û Rojava li  
hev didan û dîsa vedigeriyame şkefta xwe.  
Rêzanê kurê Kurzad Paşa ji tirsê min newêribû  
biçûna ref û nêçîrê. Lê felekê mala te xirab be.  
niha îro te ez kor kirime. te ez xistime ber  
deriyê vê şkeftê û hedana min nayê. tenê ez bi  
şûrê xwe dileyîzim û kenê zeriyan bi xwe  
tînim!

Erê. hema navê wê şkeft bû. di binê çiyayekî  
mezin de bû û devê wê gelekî fireh. sivder jî pir  
bilind bû. Qey yekî digot valayiya devê Geliyê  
Zîlan e û hatiye ketiye binê wî çiyayê bilind.  
Gewdê Qolo weke sîpanekî bilind û wisan jî  
qirase bû. Her şeqek simbelê wî. mîna rêsiyekî  
qalind û stûr bûn. Her guhekî wî mîna  
merşikekê fireh bû û bi ser girmilkên wî ve  
dakişiyabûn. Herdu çavên wî. ewrine fîq sipî  
mîna ku taqê asîman vegirt ibin li serê nixumî  
bûn. Her firnikekî wî mîna du kulfikên kewarê  
fireh û grover bûn. Bi rûniştî gava ku wî  
zendên xwe bilind dikirin yan gava milên xwe  
51

dirêjê tişteki dikirin. weke rima Rostemê Zal  
dikîşyan. Û herdu lepên wî mîna penceyên  
şêran bûn.

Rêzan hem li riya xwe çû hem jî guhdariya  
dengê wî xulyaqetê xend kir û çavên xwe jê neniqandin.

Erê hinbihin bawerî jê re çêbû. yê ku ew diçe serdana şûrê wî. ew teba bi xwe ye ku wa li ber deriyê şkeftê rûniştiye. Gava nêzîkayî lê da. xwe bi xwe got: Eehl Nexwe rast e Qoloyê Mirîxwir eve. Ê de baş e ji min û wî rel Lê dema nêzîktir bû û rind lê nerî. saweke giran ew girt û dilê wî reqisî. Rêzan dît wa şûrek di destên Qala de ye ku bi qederê bîst û pênc gazan dirêj e û bi heft gazan jî fireh e.

Qala bi şûrê xwe dileyizî û her carê qasekî ew dida çoka xwe. mîna kevên ditewand û digot viir diavêt. Bi her avêUnekê re şûr bi qûnaxa sê bîst û çar deh sedan dûr diçû. Piştî wî destên xwe li wan gelî û newalan dipa1and. şûr didît û dîsa dibire ba xwe. Careke din dîsa şûr wisan dida çoka xwe ditewand û diavêt ...

Roj ji Rêzan re hatibû serbiserê û fersenda wî ketibû ber dora ku amaca xwe bi cih bîne û xelkê xwe ji devê Ziya rizgar bike. Li wir Rêzan Çaloyê xwe di cih de hişt û ber bi Qoloyê

52

Mirîxwir ve çû. xwe bêpêjn kir û 11pawuka avêtina şûr sekinî. da rahijê û ji xwe re bibe here.

Qoloyê Mirîxwir gumana mirina xwe dikir. Lêgumana Rêzanê Paşê nedikir ku wê rojek ji rojan Lê rast bê yan dê xwe bigehîne ba wî. Rêzan ji bêvila wî dûr bi çend gavan sekinî û

xwe li hêviya avêtina şûr telandi. Qolo careke din mîna berê dîsa şûr da çoka xwe. tewand û avêt. Rêzan jî çû rahiştê. Lêmala xwedî wêran bibe hişaro pirî ku giran bû nikariya ji erdê rake. Îcar wî şûr bi erdê ve xirikand û ji şûnê dûr kir. Qolo gava destên xwe 11şûr gerand û nedît. xwe bi xwe got: Eheht Welehîn şûr çû. Ewê ku bir. wê hin tiştên din jî bibet Îcar wî jîya kavanê xwe ji kevên vekir û seriyekî bi qulpa kalanê şûr ve hişk girêda. serê din ê jîyê jî 11ranekî xwe girêda û kalan da çoka xwe tewand weke şûr avêt. Rêzan çaxê dît wa kalan jî hat. çû rahiştê da bibe cem şûr. Qolo bijîyê girt bi zirp kişand. Rêzan ji şûna xwe he11qî.çû li ber Qolo ket erdê. Qolo destên xwe lê gerand û ew da ber pozê xwe bihn kir. piştire keniyahem jî bi kenekî wisan zêde ku di şûna xwe de lal bû:

53

- Wîî! Hey Rêzanokê min. Delalê dilê diya xwe, şêrîné dilê bavê xwe, ezîzê ber dilê xelkê xwe, evîna dilê kezîzeran, merhema devê birînan, derdê dilê xemgînan, rêwiyê riya bêçûnan ... Hey malmîrat! Ka bêje? Ma ewê ku te şeyande vir, qey gotibû ku tu yê kalanê şûr jî bînî? Na, wî behsa kalanî hîç nekiribû, tenê şûr ji te xwestibû! Lê hûn kesên navrûya Rojhilatê timî dixwazin her karê xwe bi saxlemî

b1kJn. Lê hûn ji heq demayên, vêca hûn xwe jî tê de wenda d1kJn. Qey ne wisan e, Rêzanokê min?

Qoloyê M1rîxw1ryekê nekir didu û bi Rêzan girt ew 11 hevûdu pêça xist binê çoka xwe. Rêzan, çewa ku mêşek ketibe binê destar di binê çoka Qolo de wenda bû û bi ser hevûdu ve givişî, bihn lê çikiya û kete welwela rihê xwe, ber bi mirineke bêdengî ve çû. Lê ji xwe bêtir hingê ew li xelkê xwe yê dîlê Ziya f1kJrî û 11 Serbaj arê bavê xwe sêwirî, ku tavil piştî mirina wî hinek li wan zordetî b1kJn û hebûna wan ji holê hilînin. Ha wisan Rêzan hêj xwe ji binê deryaya fikr û ramanan negihandibû keviyê, Qolo ew ji binê çoka xwe derxist. Hinekî bihna Rêzanî derket, û ew têgiha ku 54

mirin jê re jî pir hêsan e. heye ku rojek bê serê xwe deyne nav axa sar. Piştî Qolo rabû ser nigan:

- Rêzan. Ka min bibe ba şûrê min.

Rêzan bi destê Qolo girt û wî bire ba şûr. Qolo rahişt şûrê xwe û herdu vegeriyan dîsa hatin ber deriyê Şkeftê. Wek berê dîsa Qolo şûrê xwe da çoka xwe û heliqand. piştî destê xwe avêtê anî û dîsa heliqand... Qolo her wisan bi şûrê xwe leyîzt. Rêzan jî li kêleka wî rûnişt û eynî weke wî şûrfkokê xwe da çoka xwe û heliqand.



Lê şûrê Rêzan bi qederê bîst gavî dûr diçû û digot şelp li erdê diket.

Rêzan li cem Qoloyê Mirîxwir ma. ta ku meh û heftîyan êkdu dagirtin û salek kuta bû. Di wê navê re Qolo tu tişt negotê. ne jî ezyetekê da wî: xwarin, vexwarin didanê û mîna xwe postekî lê kir. Lê Rêzan xwe dîl dizanibû. hem jî jiyana bi dîlîtiyeke pir zor î bizehmet. ..

Rojek ji rojan Rêzan dît ku Qoloyê Mirîxwir ji nişka ve keniya. Lê pa kenekî wisan kir ku êdî lal bû, hem jî navê keçekê hilda û mîna ku pê re xweşdev dibê xwe hejand û bir û hanî. Rêzan lê heyirî ma û ziloq bû û li devê wî nerî. Qolo jî her li evîna bi derew beziya. hin caran

55

di ber xwe de sêwirî, piştê bi dengê berz qêriya:

- Rêzan. Ez şûrê xwe nadim te ku tu ji Ziya re bibî. Daxwazeke min heye. Eger tu bi cih bînî, ewçax ez ê bidim te.

- Daxwaza te çi ye?

- Eger tu herî Gulbenda keça Xweşxan Paşa ji min re bînî, ez ê şûrê xwe bidim te.

- Ma heke tu nikaribî herî Gulbendê ji xwe re bînî, ez ê çewa karibim herim wê ji te re bînim?

- Na, naaal Rêzan, tu dikarî herî wê bînî.

- Ê de baş e, ez ê herim. Gulbend 11kur e?

- L1kurbûna wê ji min nepirse. Ez nizanim.  
Lê eger tu herî, tu yê bi .ser welatê bavê wê ve  
bibî.  
- Bi soz ku ez wê ji te re bînim, tu yê şûr bidî  
min?  
- Erê bi soz, ez ê bidim te. Lê tu nikarî bi  
siwarî herî. Îcar bUa Çaloyê te 11vir bimîne, ez  
ê seyîsUya wî bikim heta ku tu hatî.  
Rêzan 11pêşberî wê daxwaza Qoloyê Miýixwir  
ji xwe re mat bû û gelek jî heyirî, hinek sêwirî,  
piştire xwe bi xwe got: Eger ez neçim jê re Gulbendê  
neynim, eve ew şûr nade min. Eger ez şûr  
56

- IVNe  
rê hebûn ku Rêzan kar1bûyaxweş bilezîne  
û here, ne jî erd1ne rast hebûn ku bihêsanî Lê  
biçûna. Ew bi çiyayê ve hevraz bû û çû, geh  
terayî erdê bû geh rabû ser ntgan û serejêr bû,  
dîsa bi çiyayê ve hevraz hilkişiya û li çiyane  
bilind qelibî, berê wî kete newal û geliyan, li  
x1rxûlên asê sererast bû, piştire îcar xwe bera  
deşteke bê serûber da û lezand... Rêzan hin  
caran li deştan çû û dîsa bi çiyayê ve hevraz  
beziya, gahî li çiyayê çû û bi deştan ve serejêr  
kişiya... Ha wisan bi vir ve çû hem jî bi wir ve  
hat û ger û fetil dane xwe heta ku du salên wî  
kuta bûn. Di wê navê re çavên Rêzanê Paşê li  
tiştêkî xwedîgiyan neketin, ne heywanek yan jî

raw1lekdît ku ji xwe re bikuje û goşt bixwe, ne  
jî qen1m pêjna tişteki hilda. Lê ew li wê çûna  
58

nevim. Ziya jî xelkê min ji nava baxçe bernade.  
Ez nizanim keçik li kur e jî. yan li kîjan  
welatî ye. Îcar ez ê çewa rê derxînim. gelo? Lê çi  
dibe bila bibe. pêşiyên me gotine: "Desthilanîn  
fereca xêrê ye." Ez ê jî bibizivim û herim. Îcar  
heke min Gulbendê jê re anî. jixwe baş e. Lê  
eger min ew neanî. ez ê ji xwe re li riyeke din  
bisêwirim!

Rêzanê Paşê hespê xwe li ber deriyê şkeftê  
girêda. şûrê xwe avêt stuyê xwe. rabû xatir ji  
Qolo xwest û bi peyatî berê xwe da çiyê. bi lat û  
zinaran ve hilkişiya çû ...

57

xwe ya bi yabanê ve kînedoz bû û dixwest ku zû  
bigîje amaca li pêşberî xwe. Di sala sisiyan de  
rojêkê Rêzan di navsera çiyayekî pir bilind re  
derket jorê, bala xwe dayê ku ji serê pozê herî  
bilind şewkîna şivanekî tê. Hema bê hemdê  
xwe qêriya, oxek ji hinavê xwe kişand û dilê wî  
ger hindik be jî bi wê şewkînê fireh bû, bihna  
wî derket û leza xwe sist kir, xwe bi xwe got: Vê  
carê jî min dengê mirovan seh kir, îcar xem  
nîne! Êrast berê xwe da bi aliyê kerî ve, çû ba  
Şivên:

- Çaxê te bixêr, bira.

- Wey bi xêr û xweşî hatî, ya Rêzanê mêrxas.  
Ya şêrînê dilê diya xwe, ya delalê ber dilê  
Şîlana xwe, ya ezîzê ber dilê zeriyan, ya gula  
gelê Ariyan. Hey malmîrat! Rêzan, ev teyran te  
anî vir, tûran te anî? Ev çi derdê te heye, çi  
kula te ye ku tu li van deverên nenas digen"  
Xelkê te, birayê te, Şîlana te hemû di çi tengasiyê  
de ne û tu li pey çi digerî! Ka bêje, derdê te  
çi ye?

Rêzan bi wan gotinên Şivanê nenas pir  
hinzirî, li xwe fikirî û gelek sêwirî. Lê wî kir û  
nekir tu tişt jê nefamî. Şivên herwekî navika  
Rêzanî birrî be, ji çaralî ve wî dinasiya. Rêzan  
59

rtnd bala xwe da Şivên, ku zilamekî wisan  
dirêj î q1rase ye, destên meriv nagîjin ser herdu  
girmilkên wî. R1hekîreş ê dirêj lê ye, hema tu  
dibêjî qey gurzek çilo bi erçena wî ve kaşerêz  
dibe. Çav û brûne reş ên kevanî lê ne, du çavên  
reşkesperî li ser in û awirne tûj ji wan difûrin  
ku hema weke berikan mirov dihingêv1n. Gopalekî  
hezîranî di destan de ye, mirov dibêje  
qey şîşe ke brûskê ye û gurrî jê hildikişe.  
Rêzanî, ji wê heybeta Şivên saweke mezin girt û  
hey xwe bi şûnde da, çavên xwe li riya revê  
gerand. Lê Şivên pir nêzîkayî da wî û xwe jê re  
xerîbdost da nîşandan. Bi wê yekê hinbihin  
sawa Rêzanî berteref bû:

- Madem tu dizanî ku ez Rêzan im, derdê min jî helbet niha tu dizanî ku çi ye. Lê ez birçî me, hem jî pir. Eger tu karibî, bi kerema xwe hinek nan û şîr bide min.

- Weyli ser çavan, wey li ser seran, ne tişteki din îcar nan û şîr! Ez dizanim ku hûn, bav û kalên we digel toreya xwe tev mêvanpeywer in, nandar in, xerîbdost in û çavftreh in. Lê Rêzan, hêvî dikim tu 11kêmasiyên min nenêrî. Li vir ji nan û şîr pêve weki din tişteki xwarinê bi min re tune.

60

Şivanê rihdirêj navê miyekê hilda û gazî kir: Lewendê. Lewendê zû were vira! Miyê serê xwe tîk hilda li Şivên nerî û bi bezkî hat li berê sekinî. Ewî kodikeke darîn ji çeltikê xwe deranî da binê wê û şîr dot. piştî hebana nê jî vekir û danî berê. Rêzan li ser nan û şîr rûnişt û zikê birçî da berê, xwarin. Lê ji xwarinê zêdetir hey bala wî kete ser mîyên reş ê tarî ku her yekê berxeke fîq-spî li ber wan in. Heta wê demê jî wî tu kerîne wisan rengsosret nedîtibûn. Şivan hûrik hûrik pê re ket xeberdanê û wî da mijûlkirin ku fedî neke, da li xwarina xwe bidamîne. Piştî kutakirina xarinê:

- Tu şivanê kê yî.

- Teeew, tew! Hema nepirse hîn çêtir e. Min li

welatê we gunehkî pir mezin kiribû; xwîna  
gelek xortên nola te rijandibûm û mejiyên wan  
bi maran dabûme xwarin. Her çiqasî bapîrê we  
ez bi daqmoqê xwe kuştim jî, lê ez li vir jî bi  
wê kiryara xwe hatim tawanbarkirin. Îcar  
Berhîmê Şermensûrî û Nihoyê Cûdî herduyan  
ez birim dadgehê û hezar salî mana di girtîgeha  
Dûkelê de ceza dane min. Piştî ku tawanê min  
kuta bû, îcar wan ez kirim şivanê pezê reş. Lê  
61

ez dizanim ku ev lêlê ye, ka hetanî dora lolo jî  
bê û yeko yeko werin li min bibin dozdar,  
hingê rewşa min bêtirîn gemar dibe. Îcar min li  
xwe ad daye, piştî wê gunehkariya ku min  
kiribû, ez ê jî hertim li vir rindî û camêrî  
bikim, alîkariya xerîbên mîna te yên jirêketî  
bikim û ji rêwiyên belengaz re bibim alîkar.

- Ma tu hêj nû bi xwe dihisî?

- Tu niha wê yekê mepfrs. Min ewçax jî dizanibû,  
lê rika min nedihîşt ku ez bibim camêr.

Rêzan, mîna ku tu ji bona xatirê Gulbenda keça  
Xweşxan Paşayê kurê Bêzircan Paşa ketî van rê  
û dirb an, da wê ji Qoloyê Mirîx.wirre bibî?

- Erê, rast e.

- Nexwe ez ê salixê riya te bidim: Tu yê ji vir  
a wisan rast û rast sê şev û sê rojan herî bigîjî  
deýyayekê. Ew deýya ji qîr, zift û meqletîzê  
hatiye çêkirin. Lê divê ku tu pir hay ji xwe hebî

û zahf xwe nêz mekî, lewra wê te bikşîne xwe.  
Tu yê sê şev û sê rojan bend û bend ber bi Rojhilatê  
wê ve herî, piştire laqî pirekê bibî. Ew pir  
rast di nîvê Deýyayê re diçe aliyê din. Tu yê neh  
rojan li serê herî, bigîjî bejê û bikevî nav  
herêma keleşan, piştire tu yê bigîjî herêma  
efrît an û dû e jî bigîjî ya cinikan. Li wan

62

herêman, tu yê bikevî nava şer û teşqeleyên  
giran, lê serkeftin a te ye. Piştî ku tu ji hersê  
herêmên asê bihurî, tu yê bigîjî qula mêş eke  
hingiv. Piştî ku te tê hingiv xwar, îcar tu yê  
bikevî nav axa welatê Kedvan. Rê ji wir rast  
diçe heta digîje serbajarê Meyanê. Ha Xweşxan  
Paşa jî li wî bajarî rûdine. Îcar eger tu kêrhatî  
bî û mêrekî çê bî, tu yê çê bî û çê bişxulî, dê  
xwe bigîjî Paşê, û keça wî Gulbendê jî bibînî.  
De rabe here li te dereng e, oxir û felekên te yê  
xêrê bin. Riya te pir dûr e û dem jî 11te teng et  
- Spar ji bo vê agahdariyê.

Rêzan rabû xatir ji Şivanê nenas xwest û bi  
dilekî şkestî, bi yekî dagirtiyê ji kul û kederan,  
berê xwe çolebir da rê û çû. Ha wisan ew sê şev  
û sê rojan çû, giha deryaya Qîrezivtê û jê dûr  
hema kevî û kevî ber bi Rihilatê ve lezand.  
Piştî rêveçûna bi sê şev û sê rojan ew giha  
pirekê û da serê çû. Piştî rêwîtiya bi neh rojan  
a li ser pirê, Rêzan giha bejayiyeke ku tije

keleş bûn. Her keleşek mîna dêwekî mezin û  
wisan jî qirase bû. Dema Keleş çav bi Rêzanê  
Paşê ketin, tev hatin lê kom bûn, li hawîdorê  
wî zûriyan û borebor kirin. Hin caran lê xistin,  
hin canan jî wî êrîşê wan kir. Rêzan li ber xwe  
63

da û şûr dawêşand, her carê çend serî ji wan pekandin.  
Şerê kurê şêran bi keleşan re sê roj domandin.  
Keleş pir hatin kuştin, çend hebên sax  
man jî ji tirsax xwe reviyar, çûn xwe li nav daristanî  
weşartin.

Rêzan xwîdana eniya xwe ziwa kir û li riya  
xwe lezand çû. Hema carek ji nedî ve dît ku  
efrîtekî xwe ji paş ve avête ser pişta wî. wî û  
Efrîtî bi nava hevûdu girtin û êkdu gevizandin,  
li erdê teqle li ser teqle avêtin. Gelek efrîtên  
din jî hatin temaşa wan, lê kes têkilî herduyan  
nebû. Di wê navê re Rêzan keysa xwe dît û şûr  
avête stuyê wî, serî ji gewde qetand. Piştî ha  
ku dît efrîtekî din xwe avête ser pişta wî. Rêzan  
serê wî jî jê kir. Îcar yekî din xwe avête ser  
pişta wî. Ha wisan kîjan efrîtê ku hatê, wî ew  
kuşt heta ku dawî li efrîtan anî kutanekê.

Ew kiriyara efrîtan a ku xwe ji paş ve  
diavêtin ser pişta Rêzanî, ew pir hêrs kiribû,  
xwe bi xwe got: Ev efrît çiqasî bêbext in, ku  
wisan ji paş ve xwe davêjin mirovl Lê tiştê wan  
yê rind ev e, ku tev bi hev re nayên yekî.



Piştî şerê bi efrîtan re bihna Rêzan derket û  
li riya xwe lezand çû. Carekji nedî ve dît ku cinikekî  
xwe bera ser riya wî da û hat di nîvê

64

terqa rê de sekinî. Rêzan şûrê xwe hejand û  
avêt serê wî. Erê borînek jê çû, Lêhema nebêj  
orîn, mîna ku ewrên meha nîsanê bigurin deng  
da. Piştî wî dengê berz, îcar bi hezaran cinik ji  
hawîdor ve derketin û hatin êrîşî Rêzan kirin.  
Hingê Rêzan kete faqeke asê ku xilasî jê re  
ketibû qada belkî belkiyê. Wî çavên xwe 11revê  
gerandin, xwe bi xwe got: "Ji sed şertên  
mêrantiyê, not û neh rev in!" Lê riya revê jî jê  
re nehiştibûn. Hema carek fersenda xwe dît û  
bi darekê ve hilkişiya çû jorê. Cinik jî 11binê  
darê kom bûn, jê re pêkol kirin û rabûn pêdarê.  
Rêzan ma 11serê dara bilind û cinik jî 11binê  
darê sekinîn, heta ku tarîtiya şevê erd vegirt.  
Rêzan çend gulî ji darê kirin, kevirheste  
jenand û bi çelp û gulp û teqereqê ta ku agir bi  
pûşî ket, hinekî pif kirê lê gurr bû û bera wan  
gu11yan da, avêtin ser cinikan. Cinik ji êgir tirsîyan  
û hemû ji binê darê çûn, xwe ji ber çavên  
wî wenda kirin. Bîstikekê şûnde Rêzan xwe ji  
serê darê bera jêrê da û bi bez 11 riya xwe  
domand çû.  
Rêzan 11riya xweqederekê çû, lê bû sibe û  
riya wî kete rastekê, îcar nigên xwe sisit kirin

hêdî hêdî meşîya. Ew, giha tangava zinarekî

65

bilind, dît ku gutlek mêşên hingiv wisan çend merte 11raserî zinêr kom bûne û dîkin vinevin û xurmexurma wan e, hey hewara Xwedê.

Herwekî ew feryad û hewara xwe pê digehînin û jê alîkarî dixwazin. Bala wî kete ser mêşan û berê xwe ji rê averê kir, çû ber zinêr. Bala xwe dayê ku qula mêşan di binê zinarî de ye û çend kudikên hirçan hatine wir, her carê yek diçe dikevê têra xwe hingiv dixwe û dîsa tê der, îcar yeke din diçe dikevê û hingiv dixwe... Lê kîjan kudîka ku ji qulê derdidkeve, çend mêş ji jor ve xwe bera ser didin û pê ve vedidin. Hin kudik ji ber pêvedana mêşan di cih de dimrin, lê hinek na. Rêzan 11mirina kudîkan pir fikirî û qederekê 11wan temaşe kir. xwe bi xwe got: Van mêşên piçîçok ku çewa bi hevûdu re tîn bi kudikan ve vedidin û wan dikujin? Ha wisan demekê 11wan temaşe kir. Piştî gava kudikek ji ber mêşan ket erdê û mir, wî destê xwe avêt mêşekê girt û lê nerî, bala xwe dayê ku ew mêş nêr e. Lê gava dît bi ku dikeke din vedan û kudik nemir. mêşekê girt lê nerî, ku mê ye. Ew 11zayendeya mêşên hingiva bi jehrî pir şaş ma û li nêr û mêyan fikirî, xwe bi xwe got: Dêmek heçîka nêr in, timî bi zerer in, lê mêke ne

66

wisan in. Li wir Rêzan jî tê hingiv xwar û li riya xwe çû.

Piştî xwarina wî hingivî bi bît1kekê şûnde.

bevzê Rêzanî vebû. westandina wî sivik bû.

kasît1ya wî jê çû. xamît1ya wî kame bû. dilê wî

geş bû û bihna wî derket. Êdî biste û serbest wî

li riya xwe lezand. Lê berê wî li welatekî biyanî

bû ku ne riyeke rast dizaniya da pê ve here. ne

jî deverê dinasiya. Wisan hey lezand û çû. Ew

bi qederê şeş mehan çû. giha welatê Kevdan1yan.

Kevdanistan welatekî pir xweş bû; axa wî

rengê bû, gûnê dar û şînayiya erdê rengine din

bûn. kevir û lat hemû gûnesmerên berezî bûn.

çiyane kol î koloskirî xwe li her deverê

rêzbeste dikirin. deşt1ne kort î kûr dik1şîyan.

newal û gelîne teng î tenik xwe li gir û çîyan lefandibûn

... Welat ciyê xwe bi awane wisan cihê

vegirtibû ku babetên wî 11tu herêmên diyê nedihatî

dîtin. Rêzan li wan bergên pirtexlît şaş

ma. hem ji xwe re li hawîdor nerî û hêdî hêdî

gavên xwe berepêş avêtin. Ha ku dît hin siwar

derketin pêşberê wî. 11dû wan jî gelek peya tên.

wî rojbaşî da siwaran, lê rojbaşîya wî venegirtin

û hema awirên tûj danê. Ew hinekî din çû

laqî paytûnekê bû. Bala xwe dayê ku yek lê

67

siwar e ku rengê serokan Lê dikeve. Rêzan

rojbaşî dayê. Wî rojbaşîya Rêzanî vegirt, piştî

jê pirsî:

- Xortê dela. Ma tu ne Rêzanê kurê Paşayê  
Serbajarê Rojhilatê yî"?

- Te ne bi şaşî goti

- Nexweka were li kêleka min siwar bibe.

Paşê ferman da xelkê xwe ku tev şûnde vegerin.

Wî jî berê paytûna xwe da vegerandin û

Rêzanê licem xwe siwar kir, ew bi xwe re bir çû  
dîwana rengîn.

Ew beşa bejê ya ku li wî aliyê Deraya

Qîrezivtêbû, tev di destên Xweşxan Paşayê kurê

Bêzircan Paşa de bû. Li wir bavê wî, bapîrê wî,

bapîrê bav û bapîrên wî tev paşatî kiribûn,

hemû bi beramberî û wekhevîtiya xwe

navûdeng dabûn. Xelkê pir ji wê famîlê hes

dikir û di hîlbijartinan de timî ew ji xwe re dikirin  
serok û serdar.

Li wî welatî mirovan temenekî dirêj dikir. Di

zikhev de jiyan di navbera hezar û sê hezar salî

de bû. Her kes têr û tije û dagirtî bû, hemû

xwedîmal û xwedîserwet bûn. Kesî li kesî zordestî

nedikir. Qedr û giranbîhatiya mirovan pir

zêde hebû. Dema yek pêdivayê tiştekî bibûna, ji

68

kîsî dewletê pêwîstiya xwe hildida û gelş û

kêmasiyên xwe çareser dikir. Mirovên wir hîç

kal nedibûn, temen çiqas zêde hevraz diçû jî

dafên sipî xwe dervedixistin holê. Herweha kes

nexweş nediket, jar nedibû û timî bi  
xweşjiyaneke bêkêmasî li jiyanê didomandin.  
Lê gava yek dimir, laşê wî diavêtin çemê  
Kaniya Dilan. Avayîyên wî welatî tev yekqat  
bûn, hawîdorê xaniyan hemû baxçe û gulîstan  
bûn. Riyên ku di nava kuçe û kolanan re diçûn,  
tev ji kevirên almas û aqût reqaftî bûn.  
Lê belê Xweşxan Paşa, ji hinga ku Ziya kurê  
wî Dirbas digel hezar û pêncsed siwarên cengê  
ve daqurtandibûn şînoyî bû, pir li ber wan  
diket, hertim dilê wî şkestî bû û ne diva ku li wî  
welatê xweş î şên kêfeke zêde ji xwe re bike. Ha  
ji ber wê yekê wî keça xwe Gulbendê jî nedida  
mêr. Keçik wisan di mala bavê xwe de gelek nîr  
bihurandibûn û li ber çarenûsa xwe ya dahatuyê,  
ji bo mêrekî cindî bi çarçavan notirvanî  
dikir.

Rêzan, ew şev bû mêvanê Xweşxan Paşa û li  
Dîwana wî rûnişt. Ha rojek, ha du rojan, tu  
bêje roja sisiyan êvarê wî li gor toreyê xwe  
bawer dikir ku wê mazûrvanê wî jê bipirse ka  
69

derdê wî, îşê ku ew ji bonê hatiye hetanî wir çi  
ye? Lê ne mazûrvan jê pirs kir, ne jî wî derdê  
xwe gotê. Bi wî hawayî heftî û meh li pey êkdû  
beziyan, demsal bi ser hevûdu ve dewisîn û  
jimara roj û mehan ji hiş û bîra Rêzanî derketin.  
Di wê navê re wî hey çavên xwe li Gulbendê

gerandin û dixwest ku rojek berî rojekê zû wê bibîne. Lê Xweşxan Paşa Rêzanî ji xwe nediqetand, gava diçû kur wî jî bi xwe re dibir. Jixwe piştî ku Paşê zanî ew Rêzanê kurê Paşayê Serbajarê Rojhilatê ye, herweha ku fetha dinyayê jî 11ser destên wî çêdibe, zêde mola xwe da serê û qedr û giranbihatiyeke bêqedar jê re pêşkêş dikir: wî di şûna kurê xwe Dirbas de hesiband û li cem xwe hişt.

Rojekê Paşe 11Rêzan sêwirî û piştî jî xwe bi xwe got: Madem ku min law û ewlad nînin, tenê kurek hebû, ew jî di ruyê Qoloyê Mîlixwîrde bû emê Ziya, hema ez ê 11vî xortî bibim xwedî û wî bêxim şûna kurê xwe Dirbas. Belkî hema te dît rojek hat û dijminê min êrîş kir, ev dê min û welatê min biparêzel

Xweşxan Paşa nedihîşt ku Rêzan tenê bihustek jî jê dûr bibe. wî hertim ew li Dîwanê dida rûniştandin û li kêleka xwe dihişt. Çi cara Paşê 70

bi derekê ve biçûna, wî jî bi xwe re dibir û bi kesên xuyanî dida nasandin ku, lawê Paşayê Serbajarê Rojhilatê ye. Bi wê yeka Paşê, Rêzan di nava xelkê wî welatî de zû hate naskirin û her kesî ew bi hefadê Paşê xeysetnav kir.

Rêzan ketibû sêwr û ramana bo dîtina Gulbendê û kelewaca dilê wî her ku diçû zêdetir dibû. Lê belê tu fersendeke xweş lê nedibû

mêvan, ku karibe wê bibîne. Ji ber ku ew timî bi Paşê re bû, yan bi wezîr û kîzîran re digeriya. Xweşxan Paşa rojekê aqilmendên xwe tevek civandin û ji wan pirsî:

- Ev xortê hewqas mêrîn î mêrxas ku hatiye welatê me, em çî diyarî bidin wi"?

Di nava aqilmendên Paşê de zilamekî pir kal hebû. Dema wî ew gotin ji devê Paşê bihîzt, hinekî di ber xwe de kenîya û devê xwe vekir:

- Paşayê delaL. Ez divê m pêşniyarekê bînim, lê tu rind guhên xwe bide min: Bavê vî xortî jî mîna te paşa ye. Eger bavê wî ji te ne zêdetir be, ne kêmtir e. Îcar mêrantî û mêrxastiya vî, ji ya kurê te yê gorbihîşt ku niha di zikê Ziya de ye zêdetir e jî. Tu vî lawî hîç ji destên xwe bernede û keça xwe Gulbenda Ferezîn lê mehr bike.

71

Dem a zarûk jê çêbibin. jixwe ewgav tu berdiyê jî. ji vir naçe. Ev e Rêzan bû malê me û 11vir ma. Herweha tu hin berpirsyarîne mezin bispêre wî û bawerî jî bidê ku welatê wî ye. xelkê wî ye û serweta te ya wî ye. Hingê ew ji te re kedî dibe êdî ji vir naçe. Eger demeke ne dirêj di ser re bihurî. ew dê xwe ji neteweyê me bihesibîne û welatê me jî dê yê xwe bizanibe.

- Mamê xýldan. Welehîn ne beredayî ye ku ew nav 11te danîne. Eger tu bi vê tîjîfehmtiya xwe 11vir xwe bera binê erdê bidî. tu Sê herî di

Serbajarê Rojhilatê re derkevî der. Mejiyê te bêkêmasî dişixule. Tu hin tiştên nepenî kifş dikî ku hişê kesî ranagire. Ev gotina te. mîna kevîrê ku 11heriyê bikeve di nava mîxê min de cih girt.

Xweşxan Paşa biryar da ku wê keça xwe Gulbenda narîn bide Rêzanê kurê Paşayê Rojhilatê.

Îcar wî bi alîkariya hin pîrejinan Rêzan û Gulbendê gihandin hevûdu. Dema Gulbendê jî ew mizgîna xweş îşên bihîzt. rabû çû 11ber neynika bîroyê sekinî û tîmarekê da bejn û bala xwe ya tenik: xwe bi dermanên rengîn têr tîtîl-mîtîl kir. Bi wê yekê delaliya wê dubare bû. wisan bedewiyeke bi şax û şoxnaz bû ku mûrî di ser ruyê

72

Dema zarok jê çêbibin. jixwe ewgav tu berdiyê jî. ji vir naçe. Ev e Rêzan bû malê me û li vir ma. Herweha tu hin berpirsyarîne mezin bispêre wî û bawerî jî bidê ku welat ê wî ye. xelk ê wî ye û serweta te ya wî ye. Hingê ew ji te re kedî dibe êdî ji vir naçe. Eger demeke ne dirêj di ser re bihurî. ew dê xwe ji neteweyê me bihesibîne û welatê me jî dê yê xwe bizanibe. - Mamê xýldan. Welehîn ne beredayî ye ku ew nav li te danîne. Eger tu bi vê tîjîfehmtiya xwe li vir xwe bera binê erdê bidî. tu, yê herî di Serbajarê Rojhilatê re derkevî der. Mejiyê te bêkêmasî dişixule. Tu hin tiştên nepenî kifş



dikî ku hişê kesî ranagire. Ev gotina te. mîna  
kevîrê ku li heriyê bikeve di nava mîxê min de  
cih girt.

Xweşxan Paşa biryar da ku wê keça xwe Gulbenda  
narîn bide Rêzanê kurê Paşayê Rojhilatê.  
Îcar wî bi alîkariya hin pîrejinan Rêzan û Gulbendê  
gihandin hevûdu. Dema Gulbendê jî ew  
mizgîna xweş îşên bihîzt. rabû çû li ber neynika  
bîroyê sekinî û tîmarekê da bejn û bala xwe  
ya tenik; xwe bi dermanên rengîn têr tîtil-mîtil  
kir. Bi wê yekê delaliya wê dubare bû. wisan bedewiyeke  
bi şax û şoxnaz bû ku mûrî di ser ruyê

72

wê re biçûna dişimitî li erdê diketin û heft  
movik ji pişta wan dişikestin. Êdî ji kêlsima  
wê re hema meriv ne btxwara. ne vexwara û wê  
danîna ber xwe. li bejn û bala nêrgizîn binêrta.  
Eger hingê şewq û şemala wê perîya nazik  
bidana ser şevreşiya dinyayê. pêwîstiya bi rojê  
nedlma û dê roja li qatê çaran ji fihêta xwe daketina  
binê erda sergirtî û ruyê derva li xwe  
heram dikir.

Dîlan xanima serqewraşên Xweşxan Paşa  
êvarekê Rêzanî da pêşiya xwe û wî bire cem  
Gulbendê. Çaxê Rêzan kete hindur û êvarbaşî  
da bedewê. bersîva wî bi peyveke wisan xweş a  
mîna şîr û şekir hate vegirtin ku Rêzan ji zarê  
wê re heyran ma, hem jî zêdeyiya bi dubarekirina

hatina li ser seran û li ser çavan. kedera  
dilê wî yê xemgîn gihande hênikayiya baxê  
evîndaran. Piştire cih jê re nîşanda û Rêzan çû  
rûnişt. awirne hênik berda ser xal û xetên hinarokan.  
Lê her ku çû ew bejna narîn û noqziraviya  
bedewê. agirê dilê Rêzanî geştir kir û ew  
ji xwe re ket nava xewn û ramanên dilbikulan.  
Wêhingê xwe bi xwe got: Ma ez ê çewa vê keça  
delal ji Qoloyê Mirîxwir re bibim? Ev. tenê  
babet û hinkûfê min e.

73

Rêzan laqî bihişteke nû bûbû. Lêerê Gulbend  
jî eynî wisan bi çavpêketina bi xortekî mîna  
Rêzanê biyanî. dilê kesirî li zozanê dilan da  
çêrandin. Serdila wê jê re odim. odim Lêxist.  
Bîstikekê li cem wî rûnişt. piştire rabû çû  
qahwe çêkir û anî da destên Rêzanî. Gava wi  
Îyncana qahwê ji destên zeriya çavqaweyî girt.  
di binê çavan re awirekî heşaş li serçavê wê  
gerand û bi lêvine beşaş spasiyeke xweş pêşkêşî  
wê kir. Geh qulpine gahwê dadixistin hinavê  
xwe. gahî ji hinavên xwe peyvîne evînbexşî derdixistin  
mazata evîndarê. Piştî kutakirina  
qehwê. di mabeyna wan de axaftineke dûr î  
zirav domand. Êdî ew şeva xweşmeş li hersiyan  
gihabû derengiyê. Rêzan rabû maç eke gulgûnî ji  
hinarokên pembeyî stend û bi xatirxwestineke  
dilêş derket derve. çû li Dîwanê rûnişt. Dîlan

xanim jî di wê şevê de çû Xweşxa Paşa agahdar kir. ku gul bi qîma dilê bilbilê şeyda ye. Îcar ji kêfan re. çewa ku xew li Rêzanê dildar herûm bû. eynî wisan Paşe jî ew şev hetanî sibê xewşihitî ma.

Ew şev Paşê bawer nedikir ku Lêsibe bê. Bi avêtina rojê re. ew rabû û defa şahiyê da lêxistin. xelk û alema xwe civandin. daweta 74

Rêzan Ê Gulbendê lidar xist. Piştî çil şev û sî û neh rojan ku dawî 11 dawetê hat. Paşê Gulperîya xwe li can û bedena Rêzanê kurê Paşayê Serbajarê Rihilatê bi mor û qoçan da rewakirtn.

Êvarê dereng Rêzan çû kaxa Gulbendê û bû mêvanê sing û berê gewre yê qeşagirtî. Di wê navê re bû şeşşeşa ramûsan. ha li vî alî. ha li wî alî û kama dilê derdmendan sernişiv bû. Piştî wê şahîbe û kêmuşa giran bilbilê şeyda kir ku xwe bêxe nava per û baskên gula sor. lê hema carek ji nişka ve Qoloyê M1rîxwirhat bîrê. ew xelkê wî ku di nava baxçe de ji Ziya re dîl mabûn... Rêzan êdî kir û nekir hedana wî nehat. xwe bi xwegot: Hey felek heyl Ezji bo çi hatime. di kur re derketime û niha jî çi dikim? Ê axînekê ji kêrayiya hinavên xwe kişand. ji Gulbendê şûnde vekişiya. rabû kincên xwe li xwe kirin û di şûna xwe de sar bû. ponijî.

Piştire şûrê xwe tazî kir xist navbera xwe û wê.  
Ha wisan ew li aliyekî raza û bûka xemnak Jî  
li aliyê din...

Bi wê kiryara Rêzanî. dinya Gulbendê serobin  
bû û hetanî sibehê li ser serê xwegeriya;ew  
xewn û ramana berî çil rojî ku ji xwe re kiribû  
75

mîna bihişteke laleşî di derbekê de bi ser ve  
hilweşiya û wêran bû. reng û rû lê zermihîn.  
dilê wê hilavêt û taya mirinê ew hingavt. Piştire  
Gulbend fikirî. sêwirî û gelek ramiya. lê tu sedemekî  
ku ew ji vekişandina şûyê xwe ya ji xwe  
bizanibe nedît. Ji ber wî derdê bêderman şev li  
karxezala Paşê bû mîna dojah. dûvedirêj bû û  
gav û an lê bûn sal û sedsal. kete nava xewn û  
xeyalan ta ku zeraqiyên rojê xwe avêtin ser  
dilê şkestî yê birîndar.

Di sibeha wê şevê de gelşa herî zor î zehmet ji  
Gulbendê re. nîşandana paçê bi xwîn bû. ku  
ango rûsipîtiya xwe bidana eşkerekirin. Lê ji  
ber ku Rêzanê derdmend têkilî wê nebûbû. ew  
yek dê ji keçikê re bibûna rûreşiyeye mezin û  
heta ku li jiyane mabûna jî serê wê di nava  
heval û hogiran de bilind nedibû. Rêzan ew  
toreya kevn rin dizanibû û li welatê wî jî her  
ew tişt hebû. Lê toreya ku zilam di mala bavê  
de nêzî keçê nabe jî. ew destbirî dihişt. Îcar wî  
serê şûrê xwe li gurçika çipa xwe xist û laşê

canê xwe birî. Hinek ji xwîna xwe ya sor li paçikê sipî da û wê teşqela Gulbendê çareser kir.

Ew dûrbûna Rêzanî ji Gulbendê wisan her  
76

domand, Lêdîsan jî weke ku zewicî bin li cem hevûdu di binê lihêfekê de raketin, tu kesî bi xwe nedane hisandin. Bi qedere salekê dem bihurî, êdî Rêzan xwest ku jina xwe bibe û ji wir here, lê xezûrê wî nexwest ku ew here û destûra çûnê jî neda. Ji ber wê yekê hîn bêtir Rêzan hêrs bû û tebata wî hîç nehat. Ew welatê xweş, ew Dîwana geş, ew qedr û bihadana bo wî, ew zeriya wek penîrê teze, tevek li ber çavên wî reş û tarî bûn û mîna ku di dogehê de bijî di nêv agirê derdan de qijilî. Rojekê Rêzan bi tena serê xwe derkete ser banê qesrê û ji xelkê xwe yê ku Ziya ew dil kiribûn re giriya, stêrkên şor ji çavên xwe daweribandin. Lê dema Gulbendê ew deng ji ser bîhîzt, bi derencokan ve hevraz beziya çû jor û bi dUekîşewat:

- Rêzan. Delalê ber dilê min, ruhniya herdu çavên min, geşiya jiyana min. Hey Xwedê min bi qurbana bejn û bala te bike. Ez nizanim ev girîna te bo çî ye! Eger dUête bi jinan ve be, eva jineke mîna min bedew, weke min spehî nîne û hêj yeke wisan nehatiye ruyê vê dinyayê. Ez ji te re mîna mêkeweke ribat im,

mîna kevokeke aştiyê me , mîna şîraniya welêt  
im, di şûfê karxezaleke Çiyayê Şengalê de me.

77

Û ev bi qederê salekê ye tu her şev şûr dixî navbera  
min û xwe hêj rad1kevî. Niha Jî tu digrî.

Ka derdê xwe bêje! Delalê dilê min bitenê!

- Gulbend. Dilêmin bi tu Jinên bedew ve tune  
û Ji te delaltir Jî kesek nîne. Lê heçîka em Kurd  
in, di mala bavê de naçin ba qîzê. Ew îş, Ji  
toreya me der e. Îcar ez dixwazim ku herim  
welatê xwe. Lê ev çend car in ez destûr Ji bavê te  
dixwazim Jî, nade. Tiştê ku ez Ji bavê te fam  
dikim, ew dixwaze ku ez li vir bimînim. Lê  
gava ku ez Ji bo Jinekê li vir bimînim û neçim  
welatê xwe, heta ku dinya ava be wê xelkê me  
lanet li min bibarîne û dîrok Jî li min nabihure,  
wê min rûreş bidêre. Ewçaxez çêbûbim çi ye  
û nehat1bim ser ruyê dinyayê çi ye? Lê karê bi  
şeref û bi namûs ewe, ku piştî mirinê xelk  
behsa mîza xweJi kêl1kamirov re neke.

- Wî!Eger derdê te ev be, pir hêsan e. Haydê  
were em herin cem bavê min. Eger destûra me  
neda Jî, em ê herin. Jixwe ez bermalya te me û  
tu Jî malxweyê min î. Qey mafê kesî heye ku  
min û te Ji êkdu biqetîne?

Bi wan peyvên Gulbendê, Rêzan hinekî aş bû.  
Gulbendê bi destmala xwe hêstirên çavên wî  
ziwa kirin û herdu Ji ser bân daketin Jêrê. Gul-

78

bendê jê re qehwakê keland, piş ..re herdu rabûn  
çûn Dîwanê. Gulbendê got:

- Bavo. Ruyê min li ber te reş e jî, lê ez û zavê  
te dixwazin ku tu destûra me bidî, em ê herin.

Piştire Rêzan jî got:

- Paşayê min. Heta niha jî te rind ez  
nenasîme, ez, kurê paşayekî me û serdarê giştî  
i yê serbazan im. Çavên xelkê me niha li riya  
min qerimî ne. Ez divê ku tu destûra min û  
Gulbendê bidî, em ê herim welatê xwe.

- Kurê min. Jixwe lawên min nînin, tenê tu  
heyî. Min bi xweziyeke giran diviya ku tu bi  
temamî li cem min bimanayî. Gava sibehê ez  
serî deynim nêv axa sar, malê min ji te re  
dima û tu li şûna min dibûyî paşa jî. Lê eger tu  
naxwazî li vir bimînî, fermo jina xwe jî bibe û  
oxira we ya xêrê be herin.

Rêzan û Gulbend herdu çûn destên Paşê maçî  
kirin û xatir jê xwestin ku herin, Paşê got:

- Kurê min, keça min. Ez welatê xwe tev jî  
bidim we, hêj li ber çavên min hindik tê. Lê  
ez ê erdesman, dîzik û gopalê xwe ji we re  
diyarî bikim. Jixwe Gulbend dizane ku çi  
nihênî di wan de hene.

Bi dana wan diyariyan, pir kêfa Gulbendê

79

hat:

- Bavo. Eger tu wan bidî me, bes in û zêde ne jî, spas.

Lê Rêzan bi wan diyariyên xezûrê xwe gelekî zivêr bû, û xwe di çavên wî de kêmbiha hesiband.

Gulbendê zû ew da fehmandin ku ew diyarî ji her tiştî çêtir in. Herdu careke din çûn destê Paşê maçî kirin, xatirê dawîn xwestin û bê ku kes bi wan bihise ketin rê çûn.

Çaxê Rêzan û Gulbend ji bajêr derketin, Rêzan got:

- Gulbend. Pêşî em ê herim welatê Qoloyê Mirîxwir. Hespê min 11wir e. Em ê wî bigrin û hêj derbas bibin herin welatê me.

- Gidî Qoloyê Mirîxwir neyarê bavê min e. Eger ew pêjna min 11wan deveran hilde, wê bê min ji te bistîne.

- Ji bavê wî zêde ye.

Gulbendê ew Erdesmaneka bavê xwe 11erdê rast kir, hûr û mûrên wê 11hev xistin, per û baskên wê pê ve vebestin, dûvikê wê pê ve grêda. Ew û Rêzan lê siwar bûn û Gopal di kûra wê de badan. Erdesmanek bi hewa ket firiyan, bilind bû, hevraz hilkişiya ta ku derket raserî ewran. Rêzan û jina xwe di Erdesmanekê de 11 80

meydana gutlên ewrên li asîmanê heşîn ketin kêf û laqirdiyan û kamkojiya xwe tefandin. Erdesmanek çû, lê ew hay jê nebûn. Ha ku dîtîn



gihane asîmanê li ser wê kaniya ku Rêzan roja pêşî gihabû serê û jê av vexwaribû, hespê xweji berdabû mêrgê. Hinbihin xaza firê kêmandin û dantşîne ser kaniyê. Îcar ew gelek birçî bûbûn. Gulbendê ew Dîzika vala danî ber xwe û Rêzan Gopal xiste navê tê de bada. Dîzik tije birinc bû û mirîşkeke qelandî jî li serê kumîştî. Herdu li pêşberê hev li ser xwarina xwe rûniştin, geh bi axaftineke geş û xweş, gahî bi henek û evîndariya xwe ya li asîmanê banî kenîyan û ji xwe re peyivîn, hêdî hêdî 11xwarina xwe domandin.

Piştî Rêzan got:

- Gulbend. De tu li vir be, ez ê herim ka bi awakî nikarim hespê xwe ji Qoloyê Mirîxwir bidîzîm. Piştî ez ê werim û em ê siwar bibin herin welatê me.

Gulbend 11wir ma, Rêzan rabû berê xwe bi aliyê şkeftê ve da û bi çiyê ve hevraz bû. Ew çû giha quntarê, carek 11paş xwe fîtilî û li Gulbendê nerî, bala xwe dayê ku wa Qolo bi milê wê girtiye û ew bi erdê ve kaş dike. Rêzan şûnde zivirî çû giha nêzî Qolo û şûr hejand êrîşê wî

81

kir. çend derb Lêxistin. Lê npna ku şûr li zinarekî bikeve. çirîskên agir ji berê hilfîriyan.

Qolo hinekî di ber xwe de kenîya:

- Rêzan. Qaşo tu çûbûyî ku wê ji min re binî.

Ma hewqas jî xayintî? Here hespê xwe bigre.

şûrê min jî ji xwe re bibe û bi ser xelkê xwe ve here. Eger tu neçî. ez ê ji laşê te pariyê piçûk guhan bihêlim.

Rêzan bala xwe dayê ku Qolo bi şûr nayê kuştin û nikare jina xwe jê bistîne. Îcar ew jê dûredûr sekinî û çav lê zer kirin. Qolo jî Gulbendê da ber hemêza xwe. bêvila xwe danî ser ruyê wê. çend caran ew bihn kir û lezand. wê ji xwe re bir çû xist şkeftê. Rêzan jî li dû wî çû heta giha ber şkeftê. li hespê xwe siwar bû. Qolo şûrê xwe danî ber wî û bi dilekî melûl ajot çû. Rêzan hespê xwe ajot çû. lê kul û kedera Gulbendê ji dilê wî dernediket. Diviya ku wî jina xwe jî bibira. Lewra jê re dest nedida ku jina xwe ji Qolo re bihişta û bi temamî biçûna. Rêzan bi qunaxa du rojan çû. li şkeftekê rast hat û ketê. li pawuka keys û dema xwe ma. da bi awayekî firset bibîne û Gulbendê ji destên Qolo xilas bike.

Di ser Rêzanî re meh û salan hevûdu gindi-  
82

randin. hey ew li ber keys û fersenda xwe ma. Lêtu fersend jê re nedihat serbiserê ku karibe xwe bigîjîne Gulbendê û rojeke bi sihûd jî rojbaşiya xwe lê dernexist holê.

Rêzan ne bi şer dikaribû bi Qala. ne jî bi revê karibû xwe ji ber wî xilas bike. Lewra çaxê Qoloyê Mirîxwir dibeziya. gavên xwe ji ser

çiyayekî diavêtin ser yê din. Û jixwe eger wî  
pêjna Rêzanî li wan der û doran bikira. felata  
ji ber wî ne karê rostemtiya Rêzanê kurê Paşê  
bû.

Bi gihandina Gulbendê. herdu çavên Qoloyê  
Mirîxwir vebûn. Êdî ew ne kor. belkî bi ruhniyeke  
tûj a dijwar. bûbû xwediye du çavên  
dûrbîn. Gera li dinyayê û serobinkirina welatan  
jê re bû mîna ku hêkek têkeve nava lepên  
wî û rêçav bike. Di eynî rojê de Qala ji şkefta  
xwe derdiket rast diçû Rojhilatê û ji wir vedigeriya  
diçû Rojava. dîsa dihat şkefta xwe hêj  
nîvro nedibû. Ji wê zêdetir li kîjan welatê ku  
nêçîr pir hebûya. sibe zû radibû diçû wir nêçîr  
dikir û danê êvarê dîsa vedigeriya dihat şkefta  
xwe.

Rêzan weke hêsîr û pepûkan di şkefta xwe de  
ma. na eynî mîna evdal û belengazan. Lê wî  
83

nizanibû ka wê çewa karibe Gulbendê ji destên  
Qala xilas bike. Îcar wî xwe xist nava postê xezaleke  
gewr û her roj diçû li ser pozê çiyayên  
bilind digeriya û hin caran rûdinişt. xwe dixiste  
nava kevir û deviyên û li şkefta Qala dinerî.  
ka kengê ew ji şkeftê derkeve here û wê kengê  
şûnde vegere dîsa bê şkeftê. Bi wê çavdêriyê.  
Rêzan bi çax û demên çûn û hatina Qala rind  
fêr bû. Rojekê sibe zû Rêzan çaxê dît ku Qolo ji

şkefta xwe derket û ber bi Rojavayî ve çû. xwe bera jêr da û bi bez çû cem Gulbendê. Gava Gulbendê ew dît. ji xwe re şaş ma û jê re umîdeke mezin peyda bû. dilê wê xweş bû û hema xwe avêt hemêza wî. Piştî feramûş û devlikeniyeye bêhempa ya di nava henek û laqirdiyan de. jê pirsî:

- Delalê dilê min. Min digot belkî tu çûyî û te ez ji Qoloyê Mirîxw1r re hiştme.

- Qey meriv namûsa xwe ji xelkê re dihêle? De her çi be. niha ew çi bi te dike?

- Heçîka ev tlxm e. têkiliya weke me ya di navbera jin û mêran de li cem wan nîne. Qala tenê min dide ber pozê xwe û bihn dike. bihn dike û piştî dest ji min berdide. wekî din hîç têkilî min nabe.

84

Ew roj Rêzan û Gulbendê gelekî bi hevûdu şad û şadan bûn û hesreta hewqas rojên dûrketina ji êkdu hindik be jî derxistin, kama dilê wêrankirî gihandin encama şêniya evîneke jîndar. Piştî Rêzan jê pirsî:

- Gulbend. Rewşxuyan dike ku çara xilaskirina te ji destên Qala nîne. Ê ez bi hêza xwe jî ne babetê wî me ku karibim çeq lê bikim û wî bikujim. Lê yek tiştê heye; eger ez bizanibim ka rihê wî di kîjan bîra teng de ye, ez ê herim derxînim. Ewçax wê Qala bimre, ez û tu jî bi

kama xwe jîndar dibin. Eger rojekê te fersend dît jê bipirse, ka rihê wî di çi de ye û li kur e? Rêzan bi rijandida firmêzkên şor rabû xatir ji Gulbendêxwest û derket dîsa çû şkefta xwe, li hêviya çarenûsa xwe ma û kete nava xewn û ramanên derdekî nûtir.

Ew roj êvarê gava Qoloyê Mirîxw1rji nêçîrê veqeriyahat şkefê, Gulbend bi giramî, bi bezeke meşwerdekî çû pêşiya wî û xwe avêt hemêzê. Qala jî ew li ber dilê xwe şidand û pozê xwe danî ser ruyê gulavdûnî û çend caran ew bihn kir, jê re keniya, pê henek û laqirdî kirin ta ku çaxê xewa wî hat, serê xwe danî erdê û raket. Piştî sê rojan gava ji xew rabû û xwe hazir kir

85

ku here nêçîrê, Gulbendê got:

- Malikava, her roj tu diçî çolê û ez tenê 11 mal dimînim. Hedana min bi tenê nayê. Qey wisan çêdibe? Divêm ku ez jî bi te re werim nêçîrê.

- Ez çi bikim. Niha eger xezala min 11vir bûya, wê hedana te pê bihata. Lê pir ji min dûr e û nakeve dest.

- Te çi got? Qey jineka te ya din jî heye?

- Na, na. Xezala min a şeng, jiyana min, rihê min, ruhniya herdu çavên min!

- Ev tu çi dibêjî, Qolo?

- Keçê, şaş nefame. Xezal, rihê min e.

- Ê de ka here wê bîne vir?  
- Cihê ku ew lê ye, pir dûr e. Wargeha wê zozanên Çiyayên Xwînê ne û timî ava Kanîşêrînê vedixwe. Xezala min ne pîr dibe, ne jî kal... Mirin jî bo wê hatiye dUkirin. Qolo bi çiyê ve hevraz bû û dîsa çû nêçîrê. Rêzan jî ji dûr ve 11şkeftê dinerî, gava dît ew derket çû, berê xwe da şkeftê û çû ba Gulbendê. Herdu dîsa demekê bi ser êkdu ve ftrmêzik barandin û piştire jê pirsî:  
- Te tişteki ji rihê wî fam kir?  
- Rihê wî xezal ek e, yan di Xezalê de ye.

86

Xezala wî 11pišta Çiyayên Xwînêdimîne.  
- Ê de baş e. Eger ez Rêzanê kurê Kurzad Paşayê Serbajarê Rojhilatê bim, ez ê xwe býgehîn1m Xezala wî. Lê eger na, jixwe tu jê re ma û mayî.  
Rêzan ev car bi dilekî kêfdar rabû xatir ji Gulbendê xwest û zû vegeriya çû xwe gihande cem hespê xwe Çalo, lê siwar bû û berê xwe da riya Çiyayên Xwînê...

87

-v -

Çiyayên Xwînê hûn 11kû ne, gelo? Mirov çewa û bi çi hawayî kare xwe bigehîne we? Bi siwarî gelo yan bi peyatî... Bi bez û lez, an bi sebr û semaxê? Lê ne kesî bersîv dida Rêzanê

Paşê, ne jî wî ew bersîv dizanibûn. Hema berê hespê xwe dabû bi a11yêdeverine nedîtî ve û diajot. Lê kul û kedera hewqas mirovên wî ku 11nava baxçe dil mabûn, ji binnyata hinav û dil dernediketin. Timî ew 11ser pişta hespê xwe 11wan difikirî, bo wan pir diramiya û derdmend dibû. Lê wî hiç guman nedikir ku rewşa jiyana dilên baxçe gelekî xweş e û ew tev bi kêfa xwe re dileyizin: Ziyayê ku 11dora baxçe dorkirî bû, timî xwarina wan ji kêleka xwe ya rastê dertanî û dida wan. Wekî din pêdiviya wan çî hebûna ji kêleka xweya çepê dertanî.

88

Rêzanê Paşê her ajot û çû. Lê ew gihabû kur û bi kur ve diçû. wî bi xwe jî nizanibû. Hema Çalo diajot û çolebir berê xwe dabû bi aliyê Çiyayên Xwînê ve. Pa ne rê hebûn. ne jî rêwî li Rêzanî dihatin xuyakirin. Her dever çiyane asê. zinartne bilind î seqa. dahl û daristanine wisan gurr bûn ku timî xuşîna ba û bagerê ew direqisandin. Hin caran zûrîna guran dihate guhên Rêzanî. hin caran mirrîna hirçan û gelek caran jî borîna şêran jê re dilorandin. Rêzan vê carê ji bo ku namûsa xwe ji destên dijminekî zirp t jixwe bihêztir biderxîne. riyeke din a çûn û nehatinê dabû pêşiya xwe... Rêzan di wê r.ya çolebir de ne hindik birçî dibû. hin caran ditirsiya û carna jî bizava wî

zêdetir dibû. Dema ku ew digiha ser  
kanîsarkan ji hespê xwe peya dibû û ji xwe re  
pincar diçinê dtxwar û hespê xwe diçêrand. Êdî  
her wisan ew bê ne rojek. ne du rojan. ne jî îşê  
mehan bû hespê xwe ajot û çû. ta ku pênc saljimartin.

Di sala şeşan de Rêzan li çemekî rast  
hat. Bala xwe dayê ku xelkek li ber çê m sekinî  
ye; hemû zilamine bejn kurt in. çavên wan  
mîna yên mûriyan hûr in. zend û bendên wan  
weke movikên tiliyan dirêj û zirav in û çîpên  
89

wan jî mîna dûvika teşiyê qels û kurt in. Rêzan  
11wan zilaman pir heyirî û ji xwe re şaş ma: ev  
kî ne, ji çi neteweyî ne, mirovên kîjan herêma  
dinyê ne? xwe bi xwe got û rast ajot çû ba wan.  
Lê dema ew çav bi Rêzanî bi hesp û şûrê wî  
ketin, tev ji tirsan kumişîne erdê û xwe xistin  
binê giyayê. Lê Rêzan bi dilovan 1yekegerm, bi  
dengekî nerm gazî wan kir:

- Netirsin. Ez mirov im. Hatime ku derdê we  
bizanibim, ka çima hûn li ber vî çemî kom  
bûnne, li pawuka çi ne? Ez divê m alîkariya we  
bikim!

Ji wan tu kes ranebû û bersîva Rêzanî neda.  
Îcar Rêzan ji hespê xwe peyabû, çû yekî ji binê  
giyayê derxist:

- Xorto. Navê te çi ye?

Devê xort li hevûdu ket û bi bi keketiyeke



mîna ya lalan:

- Mimiminoşşş.

- Gazî hevalên xwe bike, bila tev derkevin werin vir. Ka çi derdê we heye, ez ê çareser bikim?

- Tu tu tu rast dibêjî?

- Erê.

Minoş bi dengekî noş sê caran gazî hevalên

90

xiroş kir:

- Xuroş. Keloş. Şanoş. Banoş. Xweşnoş ka werin here. Ev mirov wê alîkariya eme bikê. Netirsin. derkevin werin...

Ew kes tev bi derbekê ji binê giyayê derketin û hatin 11dora Rêzanî kom bûn. Lê gelekî bi tirs bûn. mirûzê wan kirîbû û bevz 11wan nemabû. Rêzanîji wan pirsî:

- Hûn çima li vir kom bûne?

Yekîgot:

- Li vî aliyê me xela rabûye. em tev birçî mane. Em divênji çem derbasî aliyê din bibin û ji xwe re li wir xwarin peyda bikin. Lê ava çem rê nade me.

Derdê wan kesên hûr êdî eşkere bû ku birçîbûn e. Erê. birçîbûn û ne tiştekî din. çend caran xwe bi xwe Rêzan di ber xwe de got û piştî li çareserkirina derdê wan geriya. Rêzan çû nava daristaneke dardirêj û bi şûrê xwe du

darên selwa birrîn. her yekê danî ser milekî  
xwe û ew anîn ber çem1k. Herdu daran bi êkdu  
ve girêdan avêtin ser avê. textik jî 11serê  
girêdan û rê ji wan re vekir. Ew zilamên bejn kurt  
di ser p1rikêre derbasî aliyê din bûn û ji  
xwêre çûn kedê. Rêzan jî li hespê xwe siwar bû  
91

Û ber bi Rojhilatê ve ajot çû.

Rêzan bi qûnaxa du dan û nîvê çû. ji nişka ve  
dengê b1hîzt ku hema dibêje. Rêzanê Paşê û  
hey Rêzan... Rêzan 11wî dengî şaş ma. xwe bi  
xwe got: Gelo ev deng ê kê ye ku wisa navê min  
dizane? Dengê cinan e. yan ê periyane? Lê wî  
ew deng ji xwe re nekir derd û hespê xwe ajot.  
Hinekî din çû. dîsa eynî deng hat. Vê carê bi  
qîre ke şewat ku dilê wî ji berê êşiya. Rêzan  
bersîv da:

- Tu çi kes î. gazî kîjan Rêzanî dikî""?
- Gazî te dikim!
- Ka tu 11kur î? Ez te nabînim!
- Vegere were ber pira ku te çêkiriye. tu yê me  
bibî!

Rêzan vegera hewqas rê da ber çavên xwe û  
şûnde vegeriya. Çaloy rakir çargaviyan û dîsan  
çû ber wê pirikê. Bala xwe dayê ku du xort1k 11  
wir in. lê hema bi zor serên wan di nava giyayê  
re xuya dikir. Ji wan pirsî:

- Ew hûn bûn ku we gazî min dikir?

- Erê. Paşê me got. bila bi kera xwe hetanî vir bê.

Rêzan bi sêwirandina nîsk û nokên min û paşê wan neketine nava hevûdu. çi îşê wî bi 92

min heye? di dilê xwe de sêwirand û piştî xwe bi xwe gat û: Ez herim, ez neçim? De heyran çewa hebe paşayê qewmekî ye. Divê ku ez herim saxtî bikim, ka mesele çi ye? wî destên xwe avêtin herdu xortan ew hildan li ber xwe danîn, Cala ajot û devera ku nîşan danê rast çû wir. Bala xwe dayê ku wa peyayekî bi nexş û nîşanan ve xemilandî li nav komek kesên bejnîkurd li ser textekî gûzîn rûniştî ye, li hawîdorê wî çend peyayên bi kincên nîşankirî û şûrdar li dorê ne û çavrêniya hatina wî dikan. Rêzan rojbaşî da Paşê. Piştî pirsîna li hal û çaxê hevûdu, Paşê pirsî:

- Rêzan. Tu wisan bu kur ve diçî?

- Madem tu dizanî ku ez Rêzan im, nexwe tu dizanî ku ez ê herim kur jî?

- Erê wele ez dizanim. Tu ji bo xezala Qalayê Mirîxwir diçî. Lê riya te pir zor î zehmet e; çûna te heye, lê vegera te bi şansê belkî be jî pir hindik e û heyfiya min pir li te tê.

Rêzan bi wê gotina Paşê kete nav gerîneka xewn û ramanan; xwe berwar berda û sernişîv beziya, sêwirî û li ser piştî hespê xwe ramiya,

geh pêlên deryayê ew avêtin bejê gahê ew di nava xwe de serobin kirin. Hêj Rêzanî peyvek

93

ji devên xwe demexistibû, Paşê got:

- Rêzan. Te qenciyeke pir mezin bi me kiriye, heta ez sax: bim wê çêyîya te jibîr nakim.

- Hêvî dikim tu wilo nebêjî. Ka min çi qencî bi we kiriye?

- Ev du sal in ku li me xela rabûye. Ha li wê herêma 11alîyê din ê çem, gêtîya xwarinê ye. Îcar ev du sal in her roj xelkê min diçû ber avê ku derbas bibe, lê kes nikaribû bibihure. Piştî ku te ji wan re pirik çê kir û rê vebû, em jî ji birçîbûnê filitîn. Îcar ez dixwazim ku wê qencyê 11 te vegeînîm. Jixwe tu dibînî ku tiştêkî me nîne da ez diyariyekê bidim te. Lê ez ê salixê riya te bidim ku tu yê çewa bikî û çilo bilipikî, da tu karibî xezala şeng 11 zozanê Çiyayên Xwînê bigrî. Lê belê heta ku tu xwe bigijînî wir, tu yê li gelek bela û teşqeleyan rast bibî, hewqas jî li xêr û xweşiyê... Lê divê ku tu pir hay ji xwe bimînî: Tu yê herî ji çiyarêzên Çiyayên Xwînê derbas bibî, rast herî heta ku tu bigîjî bajarê Şengeverê. Li wî welatî ne şûr hene û ne jî tiştên kuştinê ... Xelkê wir nizane kuştin çi ye, nizane mirin çi ye û nizane xirabî jî çi ye. Li wir dijminatî, kuştin, şer û lêdan nînin. Eger ew vî şûrê han bi te re bibînin, wê

ji te bêzî bikin Û kes rojbaşî jî nade te. Îcar tu  
 çaxê gihayî bajêr. tu yê bi tariya şevê re bikevî  
 navê û şûrê xwe di devereke asê de veşêrî. da  
 kes nebîne. Ew bajar. serbajarê welatê li pişt  
 çiyarêza ÇiyayênXwînêye û şênîka herêmê ye.  
 Heçîka ew der û deverin cihê jiyanê. yê kêf û  
 seyranê. yê geşt û dîlanê. yê xweşî û jiyanê ne.  
 Li bajarê Şengeverê xweşî. rindî. mirovatî û  
 perwerî pir zêde hene. Mirovên wir gelekî ji  
 hevûdu re bi kêf in û hîç tadeyî. kotek û  
 zordarî li êkdu nakin: tev bi xweşî. bi biratî û  
 bi yek rengî li jiyanêke şêrîn didomînin.  
 Li wir zilamekî şûrmend heye. navê wî Ister  
 Duymaz e. wî demekê bi nihênî du fabrîqe avakiribûn  
 û di wan de çek û şûr çêdikirin. Lê Paşê  
 wir zû pê hisiya û herdu fabrîqe dane girtin.  
 mora qedexekirinê li ser deriyên wan xist. Lê  
 niha Paşê pir kêfa xwe jê re tîne û alîkariya  
 aborî pê re dike. da ew bi dizî çek û şûran  
 çêneke û dîsa liwê fêlbaziyaxwevenegere.  
 Gava tu gihayî wir û hinekî di nava Bajêr de  
 çavnas bûyî. tu li Ister Duymazo bigere. ta ku  
 wî dibînî. Lê emanet. emanet. tu behsa navê wî  
 ji tu kesî re nekî û ji xelkê jî nepirse. lê bigere  
 heta ku tu bi xwe wî dibînî. Eger tu pirsê navê

wî ji hinekan bikî. wê di eynî rojê de Paşa pê

bihise û li te bikeve gumanê. Îcar piştî ku te wî nas kir. tu silavên min Lê bike. bêje: Bila bi nihênî kevanekî mifriq û sê tîrên pola Ji te re çêbike. Piştî ku Ji te re çêkirin. îcar tu yê xwe bigehînî Paşê û pê re bibî dost. Hem Jî hinbihin Paşê fêrî nêçîrê bike: Jê re kew û kevokan bigire û bide bistê bila goştê qelandî bixwe. Ha wisan Paşê hînî tama goştê heywan û rawilên nêçîrê dibe. Piştî ew Jî wê dest bi nêçîrê bike. Îcar di wê navê re bê eger mehek yan didu ku bihurîn. rojekê bêje Paşê: Em ê sibe zû rabin herin nêçîra Çiyayên Xwînê. Ewçax wê pir kêfa Paşê were û dê ferman bide xelkê xwe ku her kes bi te re bê.

Ji Çiyarêza Çiyayê Xwînê bi wir ve. di nîvê deşteke pir fireh î dirêj de çiyayekî groverê pir bilind î serbiberf heye. Li Jora serê wî hertim zivistan e. li quntarê bihar e. li keviyê payîz e û liJêra deştê Jî hertim kelegemýa havînê ye. Li Çiyayî kaniyek heye. xelkê wê herê mê tev wê dinasin. navê wê Kanîşêrînê ye; ava wê hênik e mîna bayê evînê. şêrîn e mîna lêvên Zînê. û tamxweş e mîna zimanê evînê. Li kêleka wê. kaniyeke din Jî heye navê wê Kanîhingivînê ye;

96

ava wê cemidî ye mîna qeşayê. şêrîn e wek badeyê. zêlal e fena peyalê û tamxweş e nola memkokên dostê. rûgeş e mîna bastêqê Eglê.

honik e mîna zebeşên Diyarbekrê û devliken e  
mîna r1hana li zozên. Ava wan herdu kaniyan  
dermanê her tiştê ye. Û xezala şeng ji bo ku pîr  
nebe. temenê wê hezalsale bibe hertim diçe ser  
wan kaniyan av vedixwe.

Tu yê xelkê wî bajarî li hawîdorê wî çiyayê  
bitenê qoredor bikî. Lê bila ew hîç varneqilin  
ku tu ji bo çi wan wisa li êkdu dileîynî. Piştire  
tu ji xwe re li dûr kozikek çêbike û xwe tê de  
veşêre. li pawuka hatina xezalê bisekine. Her  
roj serê sibê xezala şeng tê ser kîjanê ji wan  
kaniyan û av vedixwe. piştire diçe 11binê siya  
dara li jor mexel dibe. Gava nîvrokiyan tê av  
vedixwe. diçe li binê siya dara lijêr mexel dibe.  
Êvarkiyên jî gava tê av vedixwe. diçe li binê  
siya dara li quntara jorîn mexel dibe. Îcar gava  
xezalê av vexwar û çû li binê kîjan darê mexel  
hat. jixwe tu Rêzan î. de îcar ez derdê te  
nebînim.

- Pir spas. ji bo vê agahdariya ku te da min.

Lê ez nizanim ku hûn çi netewe ne!

- Em. ji azbata Hacûr û Macûr in. Di zemanê

97

Ducanê Kor de em pê ere bûbûn hevalbend û me  
li Navroyê pir xirabî bi xelkê kiribû. Îcar  
Yezdanê dilovan em tev xistin vê rewşê û avêtin  
vî welatê birçî.

Paşayê bejnurtan şûşeyek derman da

Rêzanî ku bi xwe re bibe û pê herdu fabrîqeyên çek û şûran saz bike. Îcar Rêzan xatir jê xwest û gema hespê xwe berda. panî da Calo û ajot li riya nenas a dûr î dirêj çû.

Rêzan şeş sal û şeş meh û şeş rojan bi helebeza Calo li riya nenas di ser kort û mesilan re ajot. Rojekê di navsera çiyayekî bilind re derkete bilindayiyeke tûj û çavên wî li quntara jêrîn li bajarê ketin. Lê Bajar hema bajar bû; Xwedê ew ji xwediyan re biparêze, qey yekî digot hema qozkiyeke bihişta ademîn e û hatiye li wir bi cih bûye. Xwe bi xwe sêwirî: Hebe tune be, Bajarê Şengeverê ev bi xwe ye. Bala xwe dayê ku her tişt ji yên welatê wî cihê ne; hemû tiştên bajêr şîn in; xanî şîn, rê şîn. mirov şîn. heywan şîn. erd şîn. û şîn û hey şîn... Rengê erdê û yê asîman ketine hava êkdu. pêşaneyeke wisan xweşik ji mirov re ruqal dikin ku devê miriyan jê re dikene û bayê jana jîndariyê xwe li hawîdor dilefand.

98

Rêzan serê hespê xwe ber bi bajarê Şengeverê ve serbeyjêr kir û zengû n1çandkêlekan. Ew qederek beyjêr çû, giha tangava zilamekî cotarî.

Bala xwe dayê ku herdu gayên wî şîn in, amûretên wî şîn in, erdê wî şîn e, tovê wî şîn e, m1sasa di destên wî de şîn e, hema her tiştên wî şîn e û şînayî têkilî nava hevûdu bûne.



Rêzan rojbaşî da zîlamê cotarî, zîlam lê nerî û hinekî rawestiya piştire got terep û ket erdê ji hiş ve çû. Rêzanji hespê xwepeya bû, çû serdûa wî fîrikand, bi devê xwe pif kir devê wî û ji sewîlê xwe qurçek av 11serçavê wî reşand, dîsa ew fîrikand heta ku bi hişê xwe ve hat. Piştire jê pirsî:

- Kuro, ev çî bi te hat. hey malxirab?
- Evê han ê bi te re, çî ye? Ma ew ne aletê kuştinê ye? Hêjî pîşkên welê xirab 11ser ruyê erdê mane?
- Ev, tu ji şûrê min tirsîyayî ku wisan ketî erdê?
- Qey navê vî şûr e?

Rêzanê rêwî 11wir kete nava axaftinê û bi cotariyê nenas re bû xen1>dost,11ba wî ma. Kêfa cotarî jî pir ji axaftina Rêzanî re hat. Piştire wî nanê xwe ji çeltik deranî û danî ber mêvanê 99

çolê. Diwê navê re Rêzan bala xwe dayê ku hawîdor tije kew. kîvroşk û kevok in. hema tên li hawîdorê wan diçin û tên. hîç natirsin. Wî şalika xwe ya sipî li erdê rast kir. Kewhatin li serê kom bûn û şal1kêli kewan da hevûdu. Kew seyjê kirin. pirtikandin û li wir agir dada. goşt da bistê. Ew û cotarî ketin serê û bi nanê sêlê re goştê qelandî xwarin. Lê hema carek Rêzanî bala xwe dayê ku cotarî ranekî kew ê qelandî

xist paşila xwe. wî jî xwe li nedîtinê danî û gav di ser wê demê re avêt. bihurî. Rêzan li ba zilamê cotarî ma heta ku bû êvar. piştî li hespê xwe siwar bû û ajot çû nava Bajêr. Berî ew bigîje taxê. şûrê xwe li deverekê veşart û çû xanekê hespê xweji hewand:

- Bila hespê min li vir be. wî xwedî bikin. Çi dema ez hatim. ez ê heqê we bi zêdeyîbibim.

- Lawo.wele bazara te pir xweş e.

Rêzan berê xwe da nav bajarê Şengeverê çû ji xwe re geriya. ha li vir ha li wir deverekê ji ya din nenasî; avayî û dikanên bajêr tev mîna hev hatibûne lêkirin. gûnê wan hemû ji şînî hatibûne nexşandin. Xaniyên rûniştinê tev duqat bûn. hawîdorê wan bi baxçeyên tije gulên rengareng hatibûne xemilandin. Taqê dîwaran 100

tev carnekan bûn û ji aliyê hindurê ve bi perdeyên şivtêlî xwe didane nîşandan. Deriyê wan nimrekirî bûn. Kuçe û kolanên di navbera malan de bi dirêjayiya heşt gavan fireh bûn û tev ji kevirên birrî yên berezî bi çêkirineke ,reqaftî honayî bûn. Li ser her çarriyanekê çar lewhe bi serê dîrekan ve û li ser wan nav. navnîşan û nimre nivîsî bûn. Li keviyan. peyarêne teng hebûn. di navbera peyarê û kuçan de bi rêzê darine nizmik ên tacvegirtî xwe bi êkdu ve beste kiribûn û timî şêniya xwe

rûqalê xweza û asîmanê bilind dikirin.  
Ew şev hîva li taqê asîmanê li raserê bajêr  
pir geştî zelal bû û li hawîdorê xwe haleyeleke  
mîna kembera zîvîn dorbandkirî bû. Li eynî  
taqê şîn stêrkên rengareng xwe li hevûdu  
rapêçabûn û mîna ku evîna xwe ji êkdû re  
diyar dikirin timî diîsiyan. Di navbera wan de  
hin stêrkên geştir î pir mezinjî hebûn ku quretiya  
xwe timî nîşan didan û hin caran pozêxwe  
li yê hûrik ditewandin. Lê belê Perwînê silava  
xwe ji bajêr nedibirî û timî mîna ku dadiket  
jêrê û bilind dibû hildikişa jorê. carna berwar  
diçû û hevraz dihat. Rêça Kadiz jî bi komên  
stêrkan ve xwe şûledartir dikir û pixava wê ji

101

hîva zelal nebû.

Gava Rêzan çav bi bajarê Şengeverê ket, lê  
heyîyi ma, hinek hizirî û piştire xwe bi xwe got:  
Dêmek eger mirov bide xwe û ji welatê xwe hez  
dike. çiya û zinar jî bibin gul û bostan. Bav û  
bapîrên van kesan zehmetî dane xwe û xwedîtî  
li welatê xwe kirine. Piştire van jî ha wisan li  
wê şopê domandiye ta ku vî bajali gihandine vê  
sawiya bilind a hêjayê pesn û payedartiyê.  
Piştî şev ber bi rêwüt<sup>1</sup>ya xwe ve qederekê  
meşiya. Rêzan bala xwe dayê ku her kes ji mala  
xwe derket û çê. wî jî da pey xelkê. çû giha avayiyeye  
mezin ku ne seli dihate xuyakirin ne jî

binî... Dema ew çav bi nivîsa li raserê deli ket,  
tê giha ku ew avayî dîwana gel e. Ewjî di nav  
şemata xelkê re ket hindurê Dîwanê û çû li  
cihekî rûnişt. temaşe li xelkê kir.

Dîwana Ferzende Paşa ji xelkê bajêr re wargeheke  
şên û devera şahiyê bû. Her kes êvarêji  
mala xwe radibû diçû wir. heta ku şewbêr1kbi  
dawî dihat, hêj diçû mala xwe. Li Dîwanê her  
şev kiyê bi roj tiştêkî balkêş dîtibûna. çî  
bihîzt1bûna dihat li civatê digot. Tiştên ku  
balkêş bûna. Paşê ew li cem xwe d1nMsand1nû  
dixistin çaviya masa xwe. Hin caran Ferzende  
102

Paşa bi xwe jî radibû ser kursiyê axaftinê û ji  
xelkê xwe re bûyer û nûçeyên dinyayê digotin.  
Lê tiştê ku herî zêde bala Rêzanî dikişand; 11  
civata Paşê gelek çîrok, meselok, serpêhatî û  
tiştên kevnare dihatin gotin. Xasma  
serpêhatiyên dîrokî, behsa çavkaniyên  
zimanên neteweyan, ya tore û livaka miletan,  
ji sazûman û hebûna gelên di nexşîneya cîhanê  
de pir dihatin dubarekirin.

Dema yek li civatê dipeyvî, deng ji kesî dernediket  
û her kes bi balkêşiyêke tûj dibû  
guhdar. Jixwe gava serpêhatiyên dîrokî dihatin  
gotin, hin kal hûrik hûrik di ber xwe de digiriyan  
û hinekan jî stêrkên çavên xwe bi  
mendîla destan ziwa dikirin. Ew axaftin û perwerdeya

ku li Dîwanê dihatin klrln, pir 11

xweşa Rêzanî diçû û xwe bi xwe got: Eger ez bê teşqele, bisaxî vegerim Bajarê Serbajarê Rojhilatê, dê van tiştan li Seraya me jî b1kln tore û bi cih bînlm.

Rêzan xwe li Dîwanê bédeng kiribû, tenê guhdarî dikir, dixwest ku fêr bibe ka tore û tewra xelkê wî bajarî çewa ye û çi tişt e.

Di wê navê re bîstikek bihurî Rêzan bala xwe dayê, ew zilamê cotarî yê ku naverojê li cem 103

mabû, hate wir û rast çû cem Ferzende Paşa, di guhên wî de tişteki got, piştî ew hêta qelandî ji berîka xwe derxist û dayê. Paşê qederekî xweş li hêtê nerî, dû re maçî kir û danî ser serê xwe, jê pirsî:

- Ev çi tişt e?

- Ranê kew e.

- Qeygoştê kewan tê xwarin?

- Îro zilamek hatibû ba cotê min. Wî çend kew girtin û serjê kirin, agir dada goştê wan qeland û min û wî ewxwarin.

- Ew zt1amji xelkê me bû?

- Na, nedişûfiya xelkê me.

- Ka here, ewli kur be, îşev wî bîne vir.

Bi wê gotina Paşê re, Rêzan ji şûna xwe rabû ser n1gan:

- Paşayê delal. Ew zilam, ez im.

Ferzende Paşa Rêzanî bir cem xwe û pê re  
axivî, pirsar welatê wî kir û îşê ku pê ve  
hatibû ... Lê Rêzanî hin tişt di dilê xwe de  
veşartî hiştin û rastiya mesela xwe negot wî.  
Axaftin her wisan di navbera herduyan de  
domand û gelekî kêfa Paşê hat ku pê re hevnas  
bûye. Piştî jî Paşê wî bi civata xwe da naskirin  
ku mêvanekî giranbiha ye û pêwîstiya ku  
104

her kes rêzanî jê ere bigre ferman kir. Dû re  
Paşê Rêzanî li kêleka xwe da rûniştandin û ket  
axaftineke dirêj. Di wê navê re Paşê vegeriya  
ser Xêrxwazê serkarê cotariyên xwe:  
- Karê xwe bike, sibê tu û Rêzan digel du  
zilamên din, herin çolê ji min re kew bigirin.  
Ew şev Rêzan û Ferzende Paşa êdî wisan nêzî  
hevûdu bûn, mîna ku ew heft sal bin êkdu dinasiyan.  
Çaxê raketinê, Paşê ji Rêzanî re odake  
taybetî da hazirkirin û ew şeyande ser ciyê Wî.  
Sibehê zû Xêrxwaz rabû çû Rêzanî ji xew  
şiyarkir, pêşî qahweyeke tahl jê re keland û  
piştî jî taştîya Wî anî. Piştî xwarinê herdu  
rabûn, du zilamên din jî bi xw ere birin û çûn  
kewan. Rêzan li çolê dîsa şalika xwe vegirt.  
kew hatin li serê kom bûn û şalikê li wan da  
hevûdu. Wê rojê gelek kew ji Paşê re girtin,  
anîn hatin malê.  
Ew roj êvarê ji şîva Paşê re ew kew dane

bistê. Dema Paşê goşt xwar, tameke pir xweş jê hilanî. Piştî Gazî Xêrxwazê xulam kir:

- We çewa ev kew digirtin?

- Wele ez nizanim. Mêvanê te digirtin.

Paşê ji Rêzan pirsî:

- Tu van kewan bi çi dign"?

105

- Ez wan bi şalikeke sipî digyîm. Ji ber ku li vir rengê her tiştî şîn e, îcar gava kew çav bi sipîtayîyê dikevin, ji wan weye ku berf e tîn li serê kom dibin û ez şalikê li wan didim hevûdu. Lê kewbi çekan jî tîne kuştin.

- Ê nexweem ê dest bi çêkirina şalik û çekan bikin, da em timî ji xwe re herin çolê kewan bigirin. Sibehê ez jî bi te re tîm, em ê biçin kewan.

- Bt1abe.

Roja din sibe zû Rêzan û Paşê rabûn çûne kewan. Ew roj jî Rêzan bi şalikê tîr û sertêra Paşê kew girtin û veşeriyên hatin bajêr. Ha wisan êdî tam û lezeta goştê kewan kete nava dev û diranên Paşê. Her roj sibe ew û Rêzan radibûn taştîya xwe dixwarin û diçûn çolê, ta reşikayîya şevê hêj vedigeriyên malê. Bi wê tîkîliya Rêzan a bi Paşê re, xelkê jî ew nasî û behsa mêrantî û mêrxastîya wî belav bû. Li her derî, li her malê behsa Rêzan hate kirin û pesnê wî dan.

Rêzanî pirê caran guh didane axaftina xelkê  
ka ew behsa navê Ister Duymaz dike yanena.  
Hin caran dema firset didît, bi tena serê xwe  
diçû li nava bajêr digeriya û li qahwexaneyan  
106

rûdinişt, 11xelkê guhdarî dikir. Lê wî tu hisek  
yan pêjnek ji zilamê xwe hilnanî.

Rojek ji rojan Rêzan ji derve hat Dîwanê,  
nerî ku wa zilamek 11kêleka Paşê rûniştiye;  
nêrgeleyek di devê wî de ye û kulpîn e hema lê  
dixe, mij 11ser mijê dikişîne û dûmana wî 11  
jorê bûye mîna ewrên meha adar û nîsanê  
moran vegirtiye. Ew zilam gava çav bi Rêzanî  
ket, têgiha ku Rêzan xerîbê wir e. Xêrhatin 11  
Rêzanî da û pirs rewş û jiyana wî kir, hem jî  
xwe pê da naskirin. Îcar gava wî navê xwe bi  
Ister Duymaz hilda, Rêzan êdî nikaribû kêfa  
dilê xwe bo dîtina wî binixumîne, geh di ber  
xwe de keniya gahî bişirî û hin caran jî 11  
dûmana nêrgela wî ya li taqê qarça nerî. Di wê  
navê re demekurtek bihurî, Ister Duymaz êdî  
berê xwe ji Paşê vegerande ser Rêzanî û pê re  
ket xeberdanê, pirs jê kirin. Ha wisan axaftin  
di navbera herduyan de dirêj bû, de pirsek ji  
vir na yek ji wir, mîrze Ister Duymaz rabû ser  
nîngan û bi mUÊRêzanî girt, berê xwe da Paşê:  
- Ev mêvanê te îşev ji min re ye. Sibehê zû ez  
dîsa wî tînim teslîmê te dikim.



- Fermo, tu zanî.

Ister Duymaz Rêzanî girte cem xwe û herdu

107

rabûn çûn mala wî. Ew şev wî gelek qedr û giranbihatî

bo Rêzanî nîşanda heta ku şîv hate

ber wan. Piştî xwarinê zebeşekî hênîk jî

şikandin, xwarin û piştire jê pirsî:

- Ka ji min re bêje. Derdê te çi ye, ku tu hatî

vî welatê şênîka dinê?

- Derdê min, silavên Paşayê bejn-kurtan ji te re hene.

- Li ser serê min. Ê ?

- Movikek ji qiloçên xezala şeng divê.

- Mîna ku Qolo te bêgav hiştîye? Ê de ez çi bikim | Bila îro lixava min bişixuliya, her tişt hêsan dibû | Berî çend salan min bidizî li here şûr û çek çêdikirin. Lê Paşa pê hisiya û li min qedexe kir, li xava min jî da girtin. Ez nikarim tiştêkî bikim û bo te bibim alîkar. Niha jî ev e çend sal in ku lixav bê don maye û ji bin ve naşixule, hemû zeng girtiye.

- Ka em herin lê bineri.

Rêzan û Ister Duymaz rabûn çûn derê lixavê

vekirin. Rêzan bi dizî ew şûşe ji berîka xwe

deranî û dermanê tê de rijand serê. Piştire destê

xwe avêt pntk û şixuland. Bi wê yekê pir kêfa

Ister Duymaz hat û lêhatina bi xêrdîniya nigên

Rêzan bo şixulandina lixava wî tîneke mezin lê

108

çêbû. Piştire îcar Ister Duymaz dest bi çêkirina çek û şûran kir, her ştxuland û çêkirin. Rêzan gotê:

- Tu hîç deng meke, heta ku ez destûra çêkirina çek û şûran ji Paşê distînim.

Roja din sibe zû Rêzan rabû çû Dîwanê, got:

- Paşayê delaL. Kewên vir êdî herum bûne, hew têne ser şalika min. Divê em çek û şûr çêbikin û bi wan herin nêçîrê yan hêla kewan bikin.

- Ew bîjtyê ku duhî êvarê te biribû mala xwe, berê çek û şûr çêdikirin û difrotin xelkê. Lê min xwest ku ew tişt nekevin nava xelkê min. Nexwe ez ê bêjim wî, bila dîsa çêbike, da em timî herin nêçîrê.

Ister Duymaz bi destûra Paşê çek û şûr kirin rêz. Welê zêde çêkirin ku gelek enbar hatin dagirtin.

Piştî wê destûra Paşê. hinbihin êdî çek û şûr di piyasê de jî hatin firotin. Her ku çû reklama wan hate kirin û sawa xelkê ji

talûkebûna wan şikest. Li sûka sipî jî anku bi serbestî hatin firotin û dikanên xelkê ji çek û şûrên bo firotanê tije bûn. Îcar her roj Rêzan û Paşê bi çekan ve çûn nêçîrê û kew, kevok, kîvroşik, kunêşk, qaz, bett, werdek, xezal û

109

pezkûvî kuştin.

Nav û dengê Rêzanê Paşê li nava bajêr belav  
bû. Ew bi mêrxasî, bi nêçîyvanî û bi şarezatî  
hate naskirin. Xuyaniyên bajêr, rîspî û berpirsyarên  
taxan, keyayên gundan tev hatin ew  
pîroz kirin û gelek diyarî danê. Paşê jî ew bi  
keça xwe Perîxanê xelat kir.

Gava Perîxana keça Ferzende Paşa ew xebera  
xweş a şêrîn bihîzt, rabû xwe ediland, çavên  
xwe kil kirin, rû û hinarokên hekî boyax  
kirin, fistanekî melesî li bejn û bala xwe kir û  
li pawuka hatina Rêzanê kurê Paşayê Rojhilatê  
ma di sek û rawestinê de. Gava Rêzanî digel  
pîrejineke di nava malê de derbasî hindurê  
seraya wê bûn, Perîxan herwekî çav bi baxekî  
bihiştta evîndaran bikeve hewqas kêf û şahî  
kirin û bi dilekî şad ê şadan pêrgê wî ve çû,  
xêrhatin lê da û ew bir li ser kursiyekî qedîfe  
da rûniştandin. Piştê wê qehweyeke nîvşekirî  
keland û danî ser tebsiyeke ferfûrî bir li ber  
destên Rêzanî danî ser masekokê. Çavekî Rêzan  
li Îyncan qehwê ma vekirî û yek jî li hinarokên  
gulgûnî fûilî...

Jixwe bêguman e ku delalî û gewretiya  
Perîxanê, ne kêmî ya Gulbendê bû. Ha wisan  
110

herdu bi hev re ketin xweşbêjiyeke xerîbdost,  
herwekî ji mêj ve ye ku ew êkdu dinasîn û di  
navbera xwe de şeva mirûz<layî şên kirin.

Roja din haziriya dawetê hate kirin. Gelek  
beran û beY1ndir hatin seýjêkirin û bû gêtiya  
xwarina goştê biraştî digel birinca welatê  
Maçînî. Hêj sibe zû bû. Li aliyekî Ferzende  
Paşa ketibû serê govendê, zirnevan li pêşberê  
wî bi colan dirihilî, diricifî û hin caran defvan  
defa xwe datanî erdê û zirnevan radibû serê,  
çavên xwe li Paşê ziloq dikirin ku bexşîşeke  
zêde jê bistîne. Govendgêriyên bajêr yên bi  
navûdeng hemû di milên Paşê de wek zincîran  
hevbestekirî geriyan. Pîrejinek bi xeysetê diya  
zavê geh tilîlî didan gahê "kî zava, kî zava?" bi  
qîr û bang digot û dawetvaniyan jî bi bersîva  
"Lawê te Rêzan zava" jê re diwekilandin û  
gotina xwe dubare dikirin. Li aliyê din gelek  
xortên bajêr Rêzan biribûn himamê û serê wî  
dişûştin, kincên zavatiyê jê re hazir dikirin da  
wî bibin ber darika li ser bên. Li aliyê dîtirkê  
jî hin keç û bûkên taxê Perîxana nazdar dixemilandin  
û destên wê hine dikirin, kincên  
bûkantiyê li bejn û bala yekta dilefandin û wê  
di nava bihnxweşiya dildarewî de kiribûn wek  
111

ş1mamoka li nava xerz Ê parêzan. Roja heştan  
êvarê çaxê dawet peşki1û her kes çû mala xwe,  
birazaveyan jî Rêzanê biyanî birin seraya  
şaneşîn.

Ew şev seraya Perîxanê di nava gul û çîçekan

de hatibû xemilandin û ji aliyê derva ve jî  
taqên dîwaran tev bi rengê kesk, sor û zer  
rengdêr bûbûn. Jixwe bihna misk û gulavdûnê  
wisan kiribû ku meriv bê vexwarina mey û  
badeyê serxweş dibû û serserkî li dora dinyayê  
rêger dikir. Ew şev Rêzan digel Perîxanê kete  
nava kêf û sefayê hênik, û zehmetiya hewqas  
salên rêwîtiya zor berteref kirin. Wî ew şev li  
ger û geşta zozanên hênik domand û bi  
kanîsarka qeşemê agirê dojeya dilê melisî vemirand.  
Lê ji amaca xwe ya ku ji bonê hatibû  
jî, hîç xwe dûredil nedikir.

Rêzan êdî zavayê Ferzende Paşa bû. Tu lawên  
Paşê jî nebûn. Ew, hem bû lawê Paşê, hem zavê  
wî, hem jî bûbû her tiştê wî. Berpirsariya  
serwet û sermiyantiya mala mezin, kete destên  
Rêzanî. Ew hem bû delaliyê mala Paşê, hem yê  
bajarvaniyan bû û hem jî berdilkê zeriyeke  
mîna Perîxanê... Wî li wir kêfa xwe kir, li sefa  
xwe didomand û hin caran jî diçû 11hawîdorê  
112

ÇiyayêXwînê digertya, rê û şeverêk bereçav dikirin,  
da ku cihê xezala şeng a şepal rin  
binase. Hem jî wî ew herdu kaniyên ku xezalê  
av jê vedixwarin bi çavên xwe dîtî û hersê  
darên ciyê mexelgeha wê jî di quncikekê dilê  
xwe de çeperêz kirtn.

Piştî zewaca bi şox û şenga nazenîn re ku

çend meh bihurîn, Rêzan rojekê çû ba Ister  
Duymazê çekfiroş:

- Keka can. Marewşa çekan çewan e?
- Tu hîç deng meke. Min deh embar dagirtine.
- Nexweji min re kevanekî ji m1frtqû sê tîr  
ji pola çêbike.
- Hema sibê were, hazir in.

Ister Duymaz dest bi çêkirtna kevanekî ji  
m1frtqkir û sê tîr ji pola çêkirtn. Rêzan hersê  
tîr û kevanê xwe hildan, berê xwe da serayê, çû  
cem xezûrê xwe:

- Ji xelkê re bêje, bila her kes xwe hazir bike,  
sibehê zû em diçin nêçîra Çiyayên Xwînê.

Paşê fermaneke taybetî da bajarvaniyan:

Bila her kes xwe hazir bike. Sibe zû rabe were  
ber serayê û bi zavê min re here nêçîrê.

Zilamên bajêr tev her yekê çû çekekê an

113

şûrekî ji dikanan kurrîn. Kesên ku destvala  
man jî, çûn ji embara Ister Duymaz ji xwe re  
deranîn, û hemû ketin pey Rêzanî, bi deştê ve li  
dû êkdû kaşerêz bûn. Rêzanî got

- Heçîka zilamên bijare ne bila tev, 11

hawîdorê wê qozîya ku herdu karû tê de ne  
dûredûr xwe bi êkdu ve beste bikin, da

heywanên nêçîrê nikaribin birevin. Zilamên

dîn jî bi destên hevûdu bigirtin û li hawîdorê

çiyê dor bibin.

Rêzan jî çû li nêzî kaniyê kozikek çêkir û ketê, pûş û giya avêtin ser xwe û li pawuka hatina xezala şeng me11sî. Bû kelekela germa rojê û erd sincirî. Di wê navê re bîstikek bihurî, xezala şeng ji jorê ve beýjêr bû hate ser kaniyê. Lê pa çî xezal! Bi delaliya xwe hema yekî digot qey gula berberoj e. bi reng û ruyê xwe jî mî nabû keskesora li asîmanê banî. Şax û perên herdu qiloçên wê, mî nabûn dahl û rezên çiyayê Gurdilan. Û şivtên belekotkî di serçavê wê de dinişivîne jêrê, ku ji ser eniya wê heta bi pozê şmamokî tîr diavêtin. Kabokên wê sipî, hawîdorê wan reşekî ruhn, binzika wê jî rengê sorbelek ê sipî xwe ramî didan. Du şivtên reşgûn ji stûkura wê ta di sinlsl1a piştê 114

re xwe bera ser qorikên grover dabûn. Gava serê xwe bilin fikir, mîna ku mihîneke kihêl a Mêrdînê be û ketiye çol û colanan. Her carê ku pişika xwe ji bayê hênik dadigirt, singa wê diwerpixî û dibû mîna defa hewarê.

Xezala şeng bi meşx1ramiyeke şengî hem bi nazdarî ber bi kaniyê ve beýjêr bû û hat li keviyê bihnek sekinî, li hawîdorê xwe nerî û çend caran bi bihnê xwest ku bizanibe ka kes 11 wan doran heye yan na, piştê hêj serê xwe tewande ser avê.

Ew roj feleka malwêran berê xwe ji xezalê

guharta bû, hem jî çewa û berê xwe ber Rêzanê  
Paşê ve dabû. Xezalê gava devê xwe xist ava  
zelal, Rêzanî hîç li vexwarina wê nefkirî û  
negot ku di toreya me de kuştina heywanan li  
ser avê ne durust e. Ji ber ku dilê wî pir  
êşiyabû, tev bûbû birîn û bi kul û kederan ve  
mişt bûbû. Lewra Qoloyê Mtrîxwir gelekî ew  
êşandibû, wisan kiribû ku havênê dilovaniyê li  
hemberî xezala şeng di cergê wî de nemabû. Êdî  
keyseke xweş hebû, firseteke rind jê re hatibû  
ber derê kozika wî û yek ji wan tîrên pola ji  
kevanê mîfriq hilfîrande ser bejn û bala  
xezalê. Tîra bêhawe bi bez û reqs çû 11nîvê  
115

meji ket û di qotika rastê re avêt der. Lê xezal  
gelekî zîrî bi hêz bû. derba tîrê çu tîn lê nekir.  
Rêzan gelekî li ber xwe ket ku çewan derba pêşî  
piştî xezalê neda erdê. Îcar wî tîreke din berda  
wê. Ew tîr jî piştî xezalê danexist erdê. Lê tîra  
sisiyan gelekî bêhawe çû. pir jî bi xezeb bû.  
rind xezalê hingavt. Xezal bi wê derbê li dora  
xwe doj bû. lerizî û rihlî. mîna mîyîdê tobedar  
dest bi lerzebaziyeke wisan ricfokî kir ku her  
carê bîst û pênc gazan ji erdê bilind dibû û dîsa  
dadiket. Xezal ha wisan ji xwe re reqisî. rîcîfî  
rthlî. li erdê gevîzî û her çar nigên xwe bi  
çargopalî kutan. Îcar toz û dûman ji berê  
rthabû û bi ser Çiyayên Xwînê ve beziya ew di



nava xwe de wenda kirin û astengiyeye qalind xiste navbera wî û rojê. Ji nişka ve dema xelkê dît ku li wan bû şev hem jî şevreşeke wisan tarî ku ber nigên xwe nedîtin. heyirî man û destên xwe ji hevûdu bernedan. tev di şûna xwe de bêpêjn bûn û li hatina dawiya dinyayê fikirîn.

Êdî çaxê xweşkirina dîlê nexweş ji Rêzanê Paşê re hatibû Çiyayên Xwînê û gihabû destpêka gihandina evîndara xwe. Ew dê bigîjta amac û evîna xwe ya rast î ne berdest; hêdîka ji 116

kozika xwe rabû û ber bi termê xezalêve çû. Lê pirî ku Ji termê mirî saw girt. serê pêşî xwe nêz nekir. Bîstikek rawestiya û lê temaşe kir. Erê. rast e ku bêgiyan bûye û nalive. xwebi xwe got û hêj birreka xwe Ji çeltik deranî herdu qiloç Ji qoqê serî birrîn.

Herdu qiloçên xezala Qolo. her yekê mîna gerredarekê mezin wisan Jî bi şax û gulî bûn. Gava Rêzan li wan nerî, dît ku çiqas gûnên rengan hene tev li serê hatine vegirtin û xwe têkilî nava êkdu kirine. ku mirov nikare wan Ji hevûdu biniqandina. Wî li ser şaxikekî bi qiloçê rastê ve. wêneyê marekî dît ku devê xwe vekiriye û zilamekî siwar dadiqurtîne. Hema ew dever Jê birrê û xist çeltikê xwe. Li ser şaxikekî din wêneyê dêwekî dît. ku zarûkekî

şîrmîJ dixwe. Ew şaxik Jî birrî û xiste ba yê  
din. Li ser şaxikekî bi qiloçê çepê ve Jî. wêneyê  
filekî dît ku li kerekê siwar bûye. WîJî birrî û  
xiste ba herduyên berê. Piştî Rêzan çû ba  
hevalên xwe û dest bi girtina kewan. kuştina  
xezal û pezkoviyan kirin û li hêle û nêçîrê domandin.  
ta ku roj ber bi hêlîna xwe ya nepenî  
ve serejêr bû.

Ew roj nêçîrvanên Çiyayên Xwînê pir

117

kêfxweş û şad, hem jî ne hindik şad û şadan  
bûn û bezzê hemuyan şên bû. Ji ber ku wan pir  
kew girtibûn, gelek karxezal kuştin, çend heb  
gakûvî sejjêkiribûn. Nêçîra xwe 11 erebeyên  
hespan bar kirin, kewan jî xistin telîsan û  
anîn hatin malê. Lê ji hewqas mirovan tu kes  
ne mîna Rêzan bi kêf û dilxweş bû. Ji ber ku  
nêçîra wî, ne mîna ya wanên din bû. Ê kes lê  
varneqilî bû ku wî çewa ew xezala şeng a  
Çiyayên Xwînê kuşt û qiloçên wê bi birrekê ji  
hev daxistin.

Piştî wê nêçîra ku di dilê Rêzanî de gelekî  
pîroz û giranbiha bû, êdî hinbihin wî xwe ji  
nêçîrê sist kir. Tenê xwe rihet û hêsan fikir û  
haziriya vegeerê fikir, ku bi ser keleşgewra xwe  
ya li binê penceyên zordarê devbixwîn ve here.  
Herweha nedixwest ku kes, bi çûna wî bihisin,  
bi gumana belkî be jî tavil xezûrê wî keça xwe

pê re nehinarta yan destûra çûna wî bi xwe jî neda.

Rojekê Rêzan rabû bedlek kincê zilaman li Perîxanê kir, wê 11hespekî siwar kir û şûrekî avêt stuyê wê. Ew jî çû xanê, heqê xwedîkirina hespê xwe da xanvanî û lê siwar bû, bi hinceta nêçîrê berê xwe dan çiyarêzan û hevraz ajotin.

118

Ew gihane ser qoqê bilind ê çiyê ku xwe beýjêr berdî aliyê piştê, Perîxanê gema hespê xwe kişand û di şûna xwe de rawestiya:

- Rêzan. Aqarê me 11vir xilas dibe. Em şûnde vegerim.

- Perîxan. Ez diçim welatê xwe. Eger tu bi min re têyî, fermo em herin. Eger tu nayê, oxira te ya xêrê be, tu vegere here mala bavê xwe.

Perîxan 11ser wî çiyayê bilind keyogirî bû, piştî dev bi girînê kir û hêsi bi ser hinarokên şimamokî ve barandin. Geh bi dilekî xemgîn ê bo dûrbûna ji bav û dê, ji xizm û axê, gahî ji ber negotina jê re bo çûna wan pir êşiya, hem jî pir li ber xwe ket ku mêrê wê ango pê bawer nebûye ku serê pêşî mesela çûnê bigota wê.

Bîstikekê şûnde bi vekirina dilekî melûl:

- Lê çima te serê pêşî ji min re negot? Tu malxweyê min î û ez bermalya te me. Diviya ku te mesela çûnê ji min re jî bigota. Jixwe tu herî

dojeyê jî, ez bi te re me.

- Ê de nexwe bajo.

Riya rêwîyan pir dûr bû, gelekî dirêj î bi  
zehmet bû. Lê belê hespê Rêzanî û yê di binê  
Perîxanê de, kort û mesil yekere dikirin.

119

Perîxan ji siwariya hespê pir diqerimî û dixwest  
ku hin caran peya bibe. da xwe rihet bike.

Û Rêzan jî diviya ku rojek berî rojekê zû here û  
namûsa xwe ji binê destên qirêj derxîne. herweha  
eger di Qoloyê Mirîxwîr de giyan mabe jî.  
ew bi şûrê xwe derxîne.

Roj li dû rijan lezebez kirin. meh jî hevûdu  
dihingavtin. Lê sal mîna lengeran xwe radigirtin  
û pê didan erdê sekan dikirin. Geh birçî geh  
bi xwarina pincarê. hin caran bi şevan û gahî  
bi rojan hespên xwe ajotin û çûn. Lê Perîxanê  
êdê hew xwe li ser pişta hespê kumeyt radigirt.  
Li mêrgeke xweş a bi kanî peya bûn. Perîxanê  
serê xwe danî ser çoka Rêzanî û bihnekê raket.  
Piştî dîsa rabûn li hespên xwe siwar bûn û  
ajotin. Ha wisan her çûn. şevê berî banga  
sibê xwe gihandin nêzî çiyayê şkeftê.

Rêzan ji dûr ve dît ku wa Qoloyê Mirîxwîr ji  
çiyê ve beyjêr dibe û tê. Lê ketiye tayeke wisan  
xirab hema diricife. dişllwile û bêvila wî daketiye  
erdê. mirûzê wî kiriye. guhên wî tapêl  
bûne. şûr ne pê re ye û her saetê carek ancax

dikare gavê xwe bavêje. Gulbend jî derketiye ser  
pozekî tûjik û çavrêniya hatina Rêzanê xwe  
dike. Bi wê yekê hinekî bihna Rêzanî derket.

120

dilê wî vebû û panî da hespê xwe...

Li devê newalê Rêzan û Perîxan ji hespên xwe  
peya bûn û ew lidû xwe destkêş kirin. Gulbendê  
gava Rêzan ji dûr ve nas kir. xwe bera jêrê da û  
bi bez çû pêşiyê. di nîvê palê de giha cem û xwe  
avêt hemêza wî. Li wir herdu bi hevûdu gelekî  
şad bûn û hisreta hewqas salên dûrbûna ji  
êkdu ger hindik be jî derxistin. Piştî hêdî.  
hêdî meşîyan çûn ber devê şkeftê. Qoloyê  
Mirîxwîr ji jor ve gazî kir:

- Waaa Rêzano. Hey malmîrat! Erê hema  
gunehê te bi min nehat. nehat. Lê ew xezala  
bêguneh? Hem jî li ser avê te ew kuşt. Çewa dilê  
te ragirt ku te tîra pola avêtê? Rêzano. ew  
hestiyên qilochên xezala min ku bi te re ne. bide  
min. Ad û wad li canê min ketibin. heta ku ez  
sax bim ez ê koletiya te bikim û suxrevanê te  
bim. Bila Gulbendê jî ji te re be.

- Ê de ka were vir. hêj em ê bipeyivin.

Rêzan ne bi sozê Qolo bawer dibû. ne jî ew  
hestî didanê. Ji ber ku Qolo pir dilê wî  
êşandibû. Ne jî Rêzan dixwest ku hema wisan  
zûzûka wî bikuje. Qolo bi dilekî erênayê hat.  
hat li pêşberê wî sekinî. Rêzan bala xwe rind

dayê ku stuyê wî leq bûye. guhên wî daketine,  
121

bêvila wî xwar bûye, goştê laşê wî sisit bûye û  
di rewşeke pir berbat deye. Erê ewçax rihistînê  
f1rsetkar jî xwe li dora Qala seredor kir û  
jiyana wî bi girtin û vekirina tiliyên xwe  
jimart. Lê belê Gulbendê ew jiyana bi jimar  
daxist jimartina bi vekirin û girtina lêvan. Û  
hêrsê Rêzanî girt, şûrê xwe bilin kir: Ya  
Xwedanê şev û rojan! Di nermika stû de lê xist  
û serî ji gewde pekand. Wê hingê Qoloyê  
Mirîxwir qîrek da, pa çî qîr! ku ji berê erd û  
asîman tev lerizîn; hin çiya di şûna xwe de  
tepişîn û bi deştê ve yekere bûn. Lê heçîka taht,  
lat û zinar jî tevek hilweşiyane geliyên kûr û  
ew newal tev dagirtin. Piştîre dinya bû şeverêş.  
taristan, herwekî rêwîtiya X1zr û Ilyas e ku li  
Kaniya Jiyânê digeriyan û bi ser ve venedibûn,  
çav ji çavan silavê guhartin.

Ew dem û devera taristan piştî bihneke dûr a  
dirêj, li xwe varq1lî ku evîndarên dilşkestî li  
pawuka xatirxwestina wê ya ji herêmê destb1rî  
mane. Hin ji fediyên be hin jî Ji ber şewata el1lê  
xwe yê nazik zû hate wijdanê û bayê Kurr serê  
xwe Lêcîq kir. De îcar eger tiroşa wê hebû, bila  
neçûna. Di nav bîstikekê de bi sivntka nepenî  
herêm hate malandin û bilbilê bengî çav bi  
122

gulên rengîn ket.

Qolo êdî ji wê giyana hezarsalî bê par mabû û  
termê wî ji jor ve gêndirî newalekê bûbû. ta ku  
di kûrayiya geliyê devkûr de cihê gora xwe vegirtibû  
û çiyayekî jicîhşemiti jî ew di binê xwe  
de temartibû. Rêzan. Perîxan û Gulbend êdî  
rind fêr bûn ku ew li giyana xwe bi dawî  
hatiye û hîç şûnde venagere. hêj derbasî  
hindurê şkeftê bûn û ji xwe re taştê çêkirin.  
Serê pêşî Gulbendê ji ber kêf û evîna bo  
dîtina Rêzanî. hîç li Perîxanê varneqilîbû. Lê li  
ser xwarinê bala wê ew kişand û li delaliya wê  
şaqiz ma. Dilekî wê got: Ev hêwiya min e.  
dilekî din got: na! Lê ji ber ku ew jî hatibû ser  
hêwiyeke zavanedîtî. hatina hêwiyeke li ser  
xwe jî zêde sik nedît. Di nav axaftinê re gava  
fersend çêbû:

- Rêzanê min. Ev xatûna bi te re kê ye.

- Perîxan e. Gulbend. wê jiyana min xilas  
kiriye û ez bi saxî gihandime ba te. Eger ne ji  
wê biya. ev roja me nedihat.

- Ê de baş e. Hema bila ew jî mîna xwişka  
min be. Lê ka ew Dîzika me. ka Gopal û Erdesmanek  
li kur mane?

- Ez nizanim. Wê sala ku ez û tu hatibûne ser  
123

wê kaniya li pişta şkeftê û Qolo hat te bir,  
hingê ez jî li dû we hatibûm. Êdî haya min ji

wan nemaye.

Rêzan êdî pir bi kêf, gelekî dilgeş û şad bû; du  
zerî di binê çengên wî de bûn, lê kula zeriya 11  
nava baxçe jî ji dllê wî dervediket. Wî xwe ji  
çûnê re amade kir û rabû bi aliyekî şûrê Qolo  
girt, Gulbendê bi aliyê din, Perîxanê jî herdu  
hesp li dû xwe destkêş kirin û çûne ser kaniyê.  
Li wir Erdesmaneka xwe rast kirin, per û  
baskên wê li hev xistin, dûvik pê ve danîn.  
Dîzika xwe hildan û xwe ji rêwîtiya di asîmê  
şîn re hazir kirin. Pêşî şûrê Qolo xistin Erdesmane  
kê , hersê tevî herdu hespên xwe lê siwar  
bûn, Gulbendê Gopal xist kûra wê û tê de bada,  
bayê evîna welêt jî ew bi hewa xist û rast berê  
xwe dan devera derd û kulan. ber bi baxçeyê ku  
Ziya xwe lidorê gerandibû ve çûn ...

124

- V1-

Demeke pir dirêj bihurî bû ku Rêzan ji xelkê  
xwe dût bûbû û çûbû riya çûn û nehatinê. Di  
destpêka rêwîtiya wî de her çiqasî umîda  
vegerê nebû yan vegera bi gumana belkîbelkiyan  
hebû, lê vegera wî bi vegereke wisan  
xweş a digel şûr û bi du zeriyan ve gihabû  
jîndariyeke bêhempa. Lê ji roja ku ew çûbû  
heta roja hatinê, gelek sal û zeman bihunûn,  
hêjî ew xelk tev li nava baxçe di dîlbendiya wî  
Ziyayê qirase de li jiyane didomandin. Heçîka



kal û pîrejîn bi çarçavî li vegera Rêzanî dinerî.  
Lê pirî ku demeke dirêj di ser re bihurî bû û çu  
xeber jê negirtibûn, tev ji hatina wî bêumîd  
mabûn û ji baweriyê jî daketibûn.  
Li nava baxçe nifşekî nû rabûbû ku hinek ji  
wan Rêzan nedinasîn, tenê navê wî bihîztibûn.

125

Dema ku yekcaran ji wan re behsa Rêzan  
dihate kirin, ji wan weye ku ew qehremanekî  
çîrokê ye û gencîneya çand û dîrokê bi wî dewlemendtir  
bûye.

Ew Ziya hêj li ser dîwarê baxçe dorbûyî bû,  
nedihîşt ku kes derkeve û ne jî were hindurû.  
Lê gava ku Rêzan û herdu bermalyên xwe di Erdesmanekê  
de bi hewa ketin, Ziya hat xeberdanê  
û gazî Terxanê Serdar kir:

- Mizgîniya min ji te re. Wa Rêzan di riya  
asîman re tê. Piştî demekurtekê ew tê li here  
peya dibe.

Û Ziya xweji ser dîwarê baxçe bera xwarê da,  
dûr çû û xwe li wir kir kilor. Lê kilora wî  
wisan mezin bû ku yekî digot hema sîpanek e û  
hatiye li wir bi cih bûye. Ew çiyayê goştîn qat  
li ser qatê mîna pêplûkan li dora hev dor  
dibûn, ta ku digiha sawiya çiyayên herêmê yên  
herî bilind. Gava xelkê li nava baxçe dît ku  
Ziya xwe ji ser dîwêr bera xwarê da,  
şahîbeyeke bi xax û xox kete mabeyna wan, ku

mirov digot qey êvara bîst û yekê adarê ye û  
haziriya Newrzê dikin. Dest bi def û zirnê  
kirin, govend qor bi qor li hevûdu lefiya, tilm  
û awazên şahiyê li lat û zinaran dengvedêr bûn  
126

Û ji hatina Rêzanî re dest bi reqsebazîya sêpê  
hate kirin.

Di wê navê re bîstikek bihurî dema Erdesmaneka  
Rêzanî hat giha ser asîmanê baxçe. kela  
govend û dîlana derdmendan dest bi fûrandinê  
dikir. Rêzan li nava baxçe ew cihên berê ku  
dîtibûn her çiqasî xwest ku Lêşûtî erdê bibe. Lê  
mixabin nas nekir. Ji ber ku her der bûbû  
bajêr. hem jî bajarekî fireh î şên ku her taxek  
mîna bajarkokekî mezin bûbû. Rêzanî tenê ew  
dîwarê baxçe û zinarê Kaniya Jiyanê nas kirin.  
Erdesmanek hêdî hêdî ber bi erdê ve şût bû û  
hat li ber deriyê sûra baxçe danişî. Pêşî Rêzan  
herdu jinên xwe şeyandin nava baxçe. wî û  
Terxanê Serdar jî her yekê rahişt aliyekî şûr û  
birin li ber Ziya danîn erdê. Ziya îcar dev bi  
kenekî hêç kir û bi dilekî şad î nazdar got:

- Wa Rêzan. Tu û Terxan her yekê bi aliyekî  
şûr bigirin û deynin ser stûkura min. serê min  
jê bikin.
- Ma tu dixwazî çi bikî. malmîrat?
- Ez ê xwe bikujim.
- Wêwêh! Ev hewqasa ezyetê min tev ji bo

mirina te bû?

- Erê. Jixwe. min ji bo mirina xwe te hinar-

127

tlbû şûr.

Gava ku Ziya û rihistîn bi hevûdu re ketin ceng û cîdalê, Ziya qîrek da, Lêji ber dengê wî erd lerizî, piştî dîsa gazî Rêzan kir:

- Were, îcar ez serpehatiya xwe ji te re bêjim: Du hezar û çarsed û pazdeh sal berî niha, rojekê ez di geliyekî li piştî Çiyayên Xwînê de bûm. Ewçax Dirbasê kurê Xweşxan Paşa tevî hezar û pêncsed siwarên cengê hatibûne wir nêçîrê. Ew roj Qoloyê M1rîxw1r11wan rast tê û êrîşê wan dike. Tev ji berê reviyên û xwe avêtin Gelî, bi ser min ve hatin. Îcar gava min dît ku hewqas siwarên cengê bi ser min ve tên, ez pir tirsîyam. Min dizaniya ku wê min b1kujin. Ê min ew tev digel hespên wan ve daqurtandin. Ewçax Dirbas ji ser hespê xwe terayî erdê bûbû û bi peyatî direviya. Ew jî kete ber devê min. Gava min ew jî daqurtand, wî qîrek da: Em ji ber Qala direvin, ne ku hatine te bikujin. Lê êdî min nikaribû wî ji hinavê xwe derb1xista. Heçîka yên siwar, ji ber ku ew tevî hespên xwe ketibûn zikê min, zû perçiqîn. Lê Dirbas ne wisan bû, min wî di nava xwe de sax hişt. Îcar derxistina wî zehmet bû. Diviya ku ez bihatima kuştin, hêj ew derb1keta. Eger ne şûrê

128

Qoloyê Mirîxwir bûna jî. tişteki din ê ku ez pê bihatima kuştin li dinyayê nebû. Ha ji wê sedsalê ve ta niha. min xwe tawanbar didît û ez xwevayê mirinê bûm. Peyayê ku biçûna vî şûrî ji min re bianiya jî. ji te pê ve wekî din kes nebû. Îcar ez li pawuka hatina te ya dinyayê mam ku tu ji diya xwe re çêbibî. mezin bibî û werî çaxê zewacê. herin bûkê bînin nava vî baxçeyî û ez wê digel dawetvaniyan tev di gerewa şûrê Qolo de bihêlim. da ku tu bêtî û herî şûr ji min re bîyû ez xwe pê bikujim. da ev xort ji nava min derkeve der.

Rêzan bala xwe da Ziya ku êdî giyan tê de nemye. çû li ber serê wî sek1yû û bi nermika guhekî wî girt hinekî leqand. hema dît xortek ji nava wî derket û xwe avêt hemêza wî:

- Rêzan. Ez bûrayê te me.

Rêzan bi dîtina wî xortî şaş ma û şaq1z bû lê nerî. Ha wisan bêdengiyeye sar ew tev girtin. Piştî demekurtekê ew şaşî û matmayîna wan xwe guharte se xweşî û şadiyê. Îcar Dirbasê birayê Gulbendê dev pê kir û serpehatiya xwe ji Rêzanê Paşê re bi zêr û ziber got:

- Rojekê ez bi hezar û pêncsed siwarên cengê ve çûbûme nêçîra Çiyayên Xwînê. Ew roj

129

Qoloyê Mirîxw1r li me rast hat û em tev ji berê

reviyan. li vî Ziyayî rast hatin. Lt wir vînakê hezar û pêncsed siwarên min daqurtandin. min jî di nava xwe de sax hişt. Lê ewçax gote min: Xtlasiya te li ser destên Rêzanê kurê Kuý-zad Paşayê Welatê Rojhilatê ye. Xtlasiya min jî li ser destên wî ye. Wê di filan salê de bizewice. wê bûkê bînin nava filan baxçeyî. ez ê wan tev dîl bikim û di gerewa şûrê Qoloyê Mirîxwir de bihêlim. Rêzan wê here şûr ji min re bîne. Ez ê xwe pê bikujim. Hingê tu jî xilas dibî û ez jî tawanê xwe dibînim... Îcar Ziya timî dihate nava vî baxçeyî û ji kaniya Zinêr av vedixwar. da qenim goştê laşê min di zikê wî de xirab nebe û reng û ruyê min nêtin guhartin. Rêzan. Dirbas û Terxan hersê çûne nava baxçe. Rêzan li ber derî gazî kir:

- Gulbend. Gulbend. ka were der. Mizgîniya min çi?
- Ma ji dengê te xweştir çi mizgîn heye?
- Na. nal Ka were. Va birayê te Dirbas hatiye vir.
- Îcar birayê min Dirbas? De kenê xwe mekel Gulbendê ango hiç birayên xwe nebûn. Ew di mala bavê xwe de tayê bitenê bû. Lê wê

130

bihîztibû ku di demekê de birayekî wê bi navê Dirbas hebûye û rojekê bi hezar û pêncsed siwarên cengê ve çûne nêçîra Çiyayên Xwînê,

Qoloyê Mirîxwir li wan rast hatiye, tev ji berê  
reviyane û xwe avêtine geliyekî kûr. Ziyayekî  
jî ew tev daqurtandine.

Îcar gava Gulbendê ew dengê Rêzan ê bi hildana  
navê birayê xwe Dirbas seh kir, dilekî wê  
got rast e yekî got min çu bira nînin û derket  
derve. Lê dema wê birayê xwe dît, bi d1rûf ew  
nasî û xwe avêt hemêzê. Li wir wişk û bira bi  
ser êkdû ve geh giriyan, geh kenyan û gelek  
stêrkên bi şahî verêtin.

Rêzan êdî kêfxweş û şad, hem jî pir şadan bû.  
Ew gihabû serbazên xwe û bi wan re hesreta  
hewqas salên di rê û rêwîtiyên dûr û dirêj de  
xist binê nigan û dest bi jiyaneke nû kir. Lê  
Şîlana wî hêjî xemla bûkant1yê ji ser xwe  
ne avêtibû û çavrêniya hatina wî fikir, ku pê re  
têkeve nav bihişta evîndaran.

Dest bi haziriya daweteke ji nû ve hate kirin.  
Rêzan bû zava û Şîlanê ji nû ve di nava xişr û  
bergan de hate xemilandin. Piştî bi dawîhatina  
dawetê, Rêzan hersê jinên xwe her yekê xist  
qesrekê û li serwertiya wan û dîsa li ya serba-  
131

zan nerî. Lê wî bala xwe dayê ku tewr û rewşa  
baxçe pir guheriye, mirov guherîne: ji wan  
siwarên cengê û dawetvantyan gelek zarûk zêde  
bûne, nifşine nû rabûne û bi sedhezaran nifûs  
af1riye. Li aliyê baxçe yê rastê nerî heta ku

çavên wî didîtin tev avayî bûn, kuçe û kolan  
bûn, tax bi taxê ve li dû hev kişiyabûn û li dormedarê  
meyana bajarê mezin gelek bajarkok  
hatibûne avakirin. Rêzan li wê rewşê, li wê  
bergê û rêveçûnê ji xwe re şaş ma, gelek heyirî û  
bala xwe dayê ku li wir kes naş1x.ule, karekî ji  
xwe re nake û her kes tenê li kêfa xwe dinere,  
dixwe û vedixwe. Ji wan pirsî:

- Hûn bi çi aboriya xwe dikin?

Terxanê Serdarê wî, bersîv da:

- Ji wê dema ku tu çûbûyî ta niha, r1hmetiyê  
Ziya ji kêleka xwe ya rastê xwarin û pêwîstiyên  
me hemû derd1x.1stinû didan me.

- Divê em tev biş1x.ulîn, ji xwe re ked ekê  
bikin. Eger na, em ê rezîl û riswa bibin. Pêwîst  
e em hin kargeh û karxane ava bikin, bajarê  
xwe şênt1r bikin û bi pêş ve bibin. Ev der êdî  
bûye warê me û çû. Eger hinek ji me herin Serbajarê  
Rojhilatê jî, wê gelek li vir jî bimînin.

Berî hatina Rêzan, di bajarên li nava baxçe

132

de berdîberdaneke jihevda ketî xwe bi bingehekî  
saxlem ve girtibû. Kî çi dikir çi nedikir tu  
kesî xwe berpirsyar nedihesiband. Herwekî ku  
tev zarûkên piçûk in û negihane dema kametiyê.  
wisan li jiyanêke bê raman ber bi  
demepêşê ve diçûn. Lê Rêzan ew sêr şikand. pêşî  
dest bi tekûz kirina sazûmanêke çê kir û piştê

jî dest bi avakirina dibisatan û çend xwendegehan  
kir. Îcar çi jin û çi mêr. çi kal û mindal.

çi xort û keç her kesî dev bi xwendinê kir. Li  
alijekî din jî dibistanine pîşeyî avakirin û  
kesên tîjîfêhm ên çavvekirî dane xwendin.

Dora avakirinê bû ya kargehan. Ew jî tev bi  
cih anîn û avakirin. Kargeh xebitîn. pîrek û  
zilam şixulîn û mal derxistin piyasê; malên nû  
yên bi awane nûjentir afirandin û têkiliya xwe  
bi bajarên herêmê yên din re danîn. Wan ew  
tiştên xwe yên nûderketî hinartin mazatên din  
û firotin. Ji wan mazatan jî pêwîstiyên xwe  
kurrîn û anîn bajarê xwe. Ha bi wî awayî di  
navbera du-sê salan de bajarên li nava baxçe  
xwe ragirtin û pêwîstiya ku êdî ew xwe  
pêvdivayê hin kesên din. hin çavkanîne biyanî  
bibînin nehiştin.

Lê kula Serbajarê Rojhilatê ji dilê Rêzan dernediket.  
Wî dixwest ku here carek din wî warê

133

bav Ê kalan bibîne Ê bi hemwelatîyên xwe re  
bibe jîndarê cejn û şahiyên.

Rêzan bi pêncsed siwarên cengê ve, rojekê  
rabûn li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan  
bajarê xweziya keya û keywananên dinyayê. Lê  
riya wan pir dûr û dirêj bû. Jixwe pirî ku Rêzan  
li riyên welatan geriyabû, êdî dûrbûna riyên jê  
re sivik dihate xuyakirin. Bi paniya simên



hespan çend roj ajotin û çûn. Ji dûr ve gava çav bi Bajêr ketin, bala xwe danê ku hawîdor bi dîwarekî ji berên qirase yê çarkoşe hatiye lêkirin û avayiyek tenê jî nayê dîtin. Weyla 11 vê sosretêl Weyla li vê kesnedîtîyêl Xwe bi xwe gotin û panî li hespan hildane jor.

Pêşî ew fikirîn belkî dibe ku bi şaşî hatine bajarekî din. Lê bala xwe danê çem ew çemê berê ye, hêjî bi ser Mezra Botan ve bez û colan dike. Ew çiyayên 11Başûrê wî li cihê xwe ye, ew Deşta 11Rojavayê wî jî eynî mîna berê weke xwe dimîne. Lê ev çi Beden e ku li hawîdorê bajarê wan hatiye lefandin? Wan tu tişt ji êkdu dernexistin û hespên xwe ajotin çûn ta gihane nêzî Bedenê. Êdî mesele ji wan re eşkere bû ku Bajêr ji aliyê biyaniyan ve hatiye vegirtin û hawîdorê wî ji xwe re dîwar kirine, da karibin tê de bihêsanî xwe biparêzin.

134

-VIISerbajarê

Rojhilatê pir guherî bû; dora wî bi dîwarekî bilind ê qalind hatibû lêkirin. Xelkên biyanî ketibûne navê: geh ew wêran kiribûn gahî ji xwe re şên û xweş kiribûn. Tu nabêjî cara pêşî gava ku ji aliyê Constantiusê Bizansî ve hatiye vegirtin, wî ew der ji xwe re pir girîng hesabandîye û di 349-an de dora wî bi berên birrî yê reş dîwarekî qalind lê kiriye. Bitevayî

dirêjiya Bedenê pênc hezar metre bû; qalindiya  
dîwêr di navbera sisê û pênc metreyan  
de xwe diguherand û çar rê diketin navê. Lê  
hergav ew rê bi deriyên pola radayî bûn. Li ser  
wê Bedena reşber heftê û heşt burc hebûn ku  
timî leşker di wan de li hawîdor çavdêrî dikirin.  
Lê ew Bajarê bi navûdeng ji Constantiusî  
re jî nedomandibû, dest guhartibû û ketibû binê  
hin destên din ên hîn qirêj tir. Ha wisan bi  
135

girtin Û berdana biyanîyên pirtexlît, Bajêr  
gelek caran wêran bûbû, xelkê wî perîşan û tengezar  
bûbû û rewşa jiyana wan pir xirab diçû.

Di her guhartina destekî de jî, li serê şer û  
qaleyên giran hatibûne kirin û bi avêtina  
mencenîqan piraniya Dîwêr hatibû kurisandin.

Di qada wan şerên xwîndar de hergav ên  
kuştî aleciyên Bajêr bûne, jin û zarûkên wan  
bûne, ne serbaz û serleşerên biyanî bûne. Lewra  
çi dema It serbazên biyanî pêsîrtengiyên giran  
çêdibûn, ji wir direviyan. Lê rûniştevanên  
Bajêr malên xwe nediterikadin û bi welatan ve  
nediçûn.

Serbajarê Rojhilatê ji xelkê xwe re bûbû  
devera kul û derdan, hem jî dojeheke êtûnî...  
Her derên xwe zîndan û girtîgeh bûn, qul û xewê  
re bûn, eynî wek kadîna mişkan lê hatibû. Ji  
ber hindê xelk timî xemgîn bû, stuyê xwe xwar

dikir û melûl diîsa, bendewar û jar mabû, bindest  
û perîşan bû û gelek jî birîndar bû. Li her  
deverê şîn hatibû vegirtin: ken bi dev û lêvên  
bajarvaniyan nediket û kêf, xweşî û şadan1yê 11  
xwe qedexe kiribûn. Her kes mirûzdayî û melûl  
bû, dinaltya, dikaliya û zarezar dikir. Dixwestin  
ku ji binê destan, ji destên biyaniyên

136

gemarî derkevin, rizgar bibin û timî hawar û  
qêrî didan, ku xwîna sor ziwa bibe û her der  
paqij, temîz bête xuyakirin. Belam di her vegirtineke  
Bajêr de bi hezaran serok, berpirsyar  
û xuyanî dihatin xeniqandin, zîndan û girtîgeh  
bi keç û lawên cuwan mişt î tije dibûn. Êkesên  
namerd li wan koşk û serayên wî rûdiniştin,  
kêfa xwe dikirin û gef û gur didane aleciyan ...  
Rêzanê Paşê û hevalên xwe bi rojan ji Bedenê  
dûr dibûn û bi şevan dihatin li hawîdorê wê geriyan,  
da riyeke nihênî bibînin û xwe bera  
hindur bidin. Ha wisan de şevan, du şevan, tu  
bêje gelek şev geriyan, ji aliyê çemê melûlbûyî  
ve di lexema tuwaletan re xwe bera hindurê  
Bajêr dan. De îcar bala xwe çî bidinêl Malikê tu  
mîrat bî, çewa ku mîrat jî kiribûn; her tişt  
hatiye guhartin, tişteki berê li şûna xwe  
nemaye û ne qeysa berê heye ne jî sazûmana  
bav û kalan ... Rêzan ne bavê xwe li jiyanê dît,  
ne endamên emcûmena wî, ne wan kesên rîspî,

aqilmend û xuyaniyên Bajêr ... Hemû di binê  
axa sar de dinaliyan û timî şopên şirîtên li  
stuyên xwe rapê şî milyaketên dinya din dikirin.  
Li şûna wan kesên bi şan û şeref hin kesên  
biyanî rûniştibûn û li gorî daxwaz û arezûya  
137

xwe sazûmaneke bixwîn li her deverê, di her  
malekê de bi cih kiribûn; bi şev û rojan çerxên  
sêpiyan berepêş dibezandin û hîç nizanibûn ku  
rawestin çi ye yan ji kur ve hatiye ...

Bajarvaniyên bindest ji tirsaxwînxwaran  
xwe qunc1fandibûne ser êkdu û bi zirpî xwe li  
toreya xwe lefandibûn. Wan, ew serpêhatiyên  
kirêt mîna çîrok û çîrvanokan ji hevûdu re. Ji  
zarûkên xwe re dubare dikirin û timî di guhên  
piçûkan de mesela vegirt1na welêt û ya xeniqandina  
serok û serdarên xwe digotin.

Xelkê Bajêr jixwe Rêzanê Paşê jibîr kiribû,  
tenê navê wî di bîr û hişên hinek kal û pîran de  
mabû û yekcaran di çîrokan de behsa navê wî  
dikirin. Xasma dema pîrekan zarûkên xwe di  
xew radikirin, ji wan re serpêhatiyên Rêzan û  
yên bavê wî Kurzad Paşa digotin. Lê ji piçûkan  
wetirê ku ew herdu nav nehengên efsaneyî ne,  
ne navên rast î dirust in. Tenê hin kesên  
dîrokzan hebûn ku pirê caran ew jî bi nihênî li  
qehwexaneyên Bajêr behsa Rêzanê Paşê dikirin  
û hin caran di mêjû de navê wî dixwendin: ku

hewqas sal berî niha li vî Serbajarê me yê Rojhilatê  
paşayek bi navê Kurzad hebû, kurekî wî  
yê bi navê Rêzan hebû. Paşê, keça Paşayê Ser-  
138

bajarê Rojava ji kurê xwe re xwest. Pêncî hezar  
siwar çûn ku bûkê bînin. Lê di rê de tifaqek li  
wan qewimî û Rêzan bi hewara wan ve çû. Ha  
ew roj û ev roj, îcar hatina wan ew bû êdî ku  
nehatin ...

Erê Rêzan li Bajêr bû, Lêtu kesî ew nedinasî  
û ne jî Lêbi guman dibûn ku ew zilam Rêzanê  
kurê Kurzad Paşa ye. Rêzan jî nedixwest mesela  
vexwarina ava Kaniya Jînê bigota wan, ku pê  
temenê wî dirêj bûye û bi gelek salan li welat û  
çiyaxwînan geriyaye, piştê dîsa bi serkeftî  
şûnde ve geriyaye hatiye warê xwe.

Rojekê Rêzan bi hevalên xwe şewirî û di nava  
xwe de biryar stendin ku wê li hemberî dijminan  
dest bi şerê azadiyê bikin. Lê çî cûre şer, çî  
hawe berxwedan û serhildan? Diviya ku pêşî  
wan bîndestiyê rind bi xelkê bidana fêmkirin û  
desteka wan bigirtina. Eger ne wisan bûya,  
umîda serkeftina wan li hemberî dijmin û qewirandina  
dijminî ji welêt ne karekî hêsan bû.

Rêzan û hevalên xwe pêşî dest pê kirin bi  
xelkê re têkilî danîn; bi oldaran re, bi rîspî û  
xuyaniyên Bajêr re pêwendî danîn, dû re bi  
gundiyan re ketin danûstendinê û ew bi rewşa

bindestiya wan û ya vegirtina welatê wan ji  
139

aliyê biyaniyan ve agahdar kirin. Ha bi wan  
kirin û kiryanan demeke dirêj nebihurî,  
rêxistineke tekûz a binerd derkete holê. Serokatiya  
rêxistinê ji kesên zana, tîjîfêhm û  
dûrbîn hate hilbijartin, dest bi xebateke bi  
rêkûpêk kirin û binerd her şlxulîn.

Di wê navê re çend salên din jî di ser wan re  
beziyan. Îcar Rêxistinê têkiliya xwe bi derva re  
zexm kir, hinbihin alîkarî jî wergirt. Piştî  
gelek rêxistin, sazgehên mirovatiyê û dewletên  
demokrat alîkariya xwe ji wan re  
nehêvişandin û ew destek kirin, di raya giştî ya  
cîhanê de propagandeya wan hate kirin, piştî  
jî xwe ji şerê azadiyê re hazir kirin.

Êdî ji aleciyan re dem gihabû serbiserê, hem  
ji demê ew dereng jî mabûn. Diviya ku rojek  
berî rojekê dijminan ji welatê xwe biqewirînin  
û 11cîhana ruhn1k bigîjin devera ku jê re seza û  
babetên wê ne.

Şevêkê berî kazima beyanê dest bi şerê  
azadiyê hate kirin; di êrîşa pêşî de Rêzan avête  
ser Seraya Bajêr û hemû karbidestên biyanî hêj  
di xewa şerî de bûn dîl kirin. Di eynî saet û  
demê de 11 hemû herêmên Bajêr û 11 gelek  
bajarên din, eynî cûre êrîş hatin kirin, berpir-  
140

syar Ê leşerên li wan deveran tevek dîl ketin  
dest. Gelek serbaz û serdarên welatparêz jî yên  
ku di leşkeriya dijminî de bûn, eynî bizava  
birûmet dane nîşandan û dest danîne ser hemû  
tiştên biyaniyan. Lê li hin deveran leşkerên  
dijmin li ber xwe da û bi azadîxwazan re şerekî  
dijwar kirin.

Piştî destpêka şerê azadiyê karbidestên  
biyanî gelek terefdar bo xwe çêkirin û ji a1eciyan  
hinek peya kirrîn: çek dane destên wan û  
ew bera pêşîra azadîxwazan dan. Her ku çû şer  
giran bû û tîna xwe nîşan da. Ew şerê xwebixwetiye  
rewş û tewrine cihê derxistin hOlê û her  
wisan berdewam kir ...

Serê pêşî kesekî bawer nedikir ku şerekî  
wisan dikare li pêşberî karbidestên biyanî  
bête lidarxistin. Lê gava deng û pijaqên bihna  
azadiyê li bêvila her kesî da û ku gundî Jî tev bi  
meselê hisiyan, her kes Ji tangava xwe rabû  
ser nigan û ber bi barîgeh û tofên dijminan ve  
çûn, êrîşine diJwan birin ser wan. Li hin deveran  
hey şer di navbera xelkê û leşkerên dijmin  
de domand, lê li hin deveran Jî dijmin hîç  
bizav nekir û alaya xwesipartinê hilda. Lê êdî  
roja rojê hatibû ber devê deriyê her welat-  
141  
parêzekî ku tola xwe bîstandina û dilê ji kulan  
dagirtî vala bikirina.

Bi wan destek û piştgiline mezin ku ji Rêzanê  
Paşê re çêdibûn. wî bi du salên şer welatê bab û  
bapîrên xwe bi temamî xist binê çavdêriya  
Alaya Rengîn û li her deverê des bi şahî û  
govendê hate kirin. Xasma li ser Bedena Bajêr  
çarn1kal Alayê xwe hej and û bi bihayê xwîna  
şehîdan dest bi reqw û colaneke evîndar kir.  
Piştî rawestina şerê azadiyê. dadgeheke  
nijadî ji bo mehkemekirina dijminan hate damezirandin.  
Heçî karbidestên ku xwîna xelkê  
rijandibûn. tawanê ku sezayên kiryara xwe bûn  
dîtin. Lê yên ku xwînê nerijandibûn û hin  
gunehên din kiribûn. her yekê li gor kiryara  
xwe parekê wergirt û kete navbera çar  
hişketaqan. Biyaniyên sivîl jî digel jin û  
zarûkên xwe, bi destûra Rêzanî ji Bajêr derketin  
û tev qeştiyan çûn welatê ku jê hatibûne wir.  
Rêzan hê ji nû ve dest bi avakirina Bajarê  
wêrankirî yê ku hewqas salên dirêj 11serê şer û  
qaleyên giran çêbûbûn kir û xwe ji jiyanê nû  
ya zor î bi zehmet re berepêş da Ew jiyan dîsa ji  
nû ve ber bi demepêşê ve çû. Lê gelek nifşên  
nûhatî mîna veg1rtinên pêşî. dîsa ji warê xwe  
bêpar man ...

142

Pirtûkên Çapbûyî:

1) Xwençe Cild 1. 2) Xwençe Cild II, 3) Xwençe  
CUd III. 4) Xwençe Cild IV. 5) Xwençe Cild V, 6)



Xwençe CUdVI, 7) Işkencede 178 Gûn, 8) Nimûne  
Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî. 9) Siyabend û  
Xecê.

143

Pirtûkên klasîk ên wergera ji tîpên erebî bi  
latênî û çapbûyî:

)'!.-'~.ý~,,'.05 ~. "...(. • ..;1,  
~. " • -,,;. "' ~ ~ ~ .. Co': •• ..

1) Dîwana Melayê Cizîrî, 2) Nûbihara Ehmedê  
Xanî, 3) Mewlûda Kurmancî ya Melê Bateyî, 4)  
Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî ya Mele Ehmedê  
Qoxî, 5) Sirmehşera Feqe Reşîdê Hekarî, 6)  
Nehe-ul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, 7) Dîwana  
Pertew Begê Hekarî, 8) Rewdneîma Şêx Evdirehmanê  
Axtepî, 9) Dîwana Şêx Evdirehmanê  
Axtepî, 10) Mîrsad-ul Etfala Şêx Mihemed Kerbela.  
11) Iqdê Durfama Şêx Eskerî, 12) Herdubat,  
Mewlûda Mele Zahidê Diyarbekrî, 13) Leyl û  
Mecnûna Şêx Mihemed Can.

144

Welatê bi navûdeng pir fireh, gelekî mezin û  
bi deşt û çiyayên xwe ve xemilî bû. Deştên wî  
yên avî her cûre fêkî, zebze û meywe diafirandin.  
Çiyayên mezin î pahn digel newal û  
geliyên tije dar û bi daristan xwe ji bihiştê  
zêdetir bihadar dikirin, yek li dû yekî xwe  
rapêçî hev kiribûn û li hawîdorê welatê xwe seredor  
dibûn. Welêt tixûbê xwe yê Rojhilatê gihandibû

ta bi Çîn û Maçînê. Tixûbê Rojavayê,  
digiha nêzî Tengava Tengavstanê. Yê Bakûr, gihandibû  
çiyarêza Çiyayên Qafqasê. Ji Başûr ve  
jî tixûb digihande ta bi Mala Xwedê û piraniya  
Berrîstana sîlekan xistibû nava cergên xwe. J'

PENCÎNAR

WEŞANXANEYA ÇANDA KURDI

ISBN91 972090 0 7

\*\*

## KEÇA KURD ZENGÊ

Cemşîd Bender

Çîrok

NUDEM

Weşanên Nûdem: 31

Keça Kurd Zengê

Çapa Yekem: Stockholm 1997

© Kurdiya wê Weşanên Nûdem

Pergala bergê û rûpelan: Nûdem

Wêneya bergê: Rebwar Saîd

Wergera ji tirkî: F. Ceweri û S. Demir

Navê eslî: Kilrt Kizi Zenge

ISBN: 91 888592-31 6

Adres:

Termov. 52

U& 77 JarfSlla-Sweden

Tel û faks: 8-583 564 68

NAVEROK

Çîrokajiyamin 5

Keça kurd Zengê 9  
Tivinga rênçber 16  
Xwîn 22  
Serlêdana azadiyê 25  
Mirina Mirîşka Spî 42  
Ohana ku li qederê vedigere 46  
Dagirtina valahiyan 53  
Si hêrbaz, ez û mirovê sêyem 62  
Qitik 70  
QesabêToursî 77  
Rawestgeha Karîdesê 88  
Herî 95  
Made in Germany 99  
Pir 108  
Zeynelê kurd ê erebevan 114  
Zilamêdi valahiyêde 124  
Çîroka jiyana min  
Cemşîd Bender  
Bavê min ji Şarikê (bi qeza Kbcê ya Bîngolê ve girêdayî ye) diya  
min jî bi malbata xwe ji qeza Wanê, Başkaleyê bi peyatî bi rê  
dikevin. Ew ji van deverên ku di şerê cîhanê yê yekemîn de îşgal  
bûbûn diqetiyên. Malbatên kurd yên ku li Edenê bi cih dibin, di  
jiyana koçberiyê de, gelek zehmetiyên dikşînin û têkoşîna man û  
nemanê didin. Gava Firansîz Edenê îşgal dikin, yên ku ji tayê û ji  
êşa zirav li ser lingan dimînin, pêşî dikevin riya Bozantiyê. Ew serpêhatiya  
diya min, ya ku çawa ew peya ji Wanê didin rê û di nava  
kevir û deviyên de di Helebê re xwe digihînin Edenê, piştî ku ez  
mezin bûm min ji wê bihîst. Tiştên ku diya min ji min re behs kirin,

ew zehmetiyên gelê kurd yên pêşî bûn ku min dibihîstin. Ew qedera gelê kurd hê jî nehatiye guhertin. Gelê kurd niha di bin êş û zilmeke diwartir de ye. Erê, ez di sala 1927'an de hatim dinyayê. Ew sal salên nûavakirina Cumhuriyetê bûn. Bi têkoşîna dê û bavê min ya li hember zehmetiyên bicihbûna bajarekî nû, me dest bi dibistanê kir. Min dibistana destpêk, navîn û lîse li vî bajarî qedand. Min di sala 1946'an de li Stembolê dest bi xwendina unîversîteyê kir. Ev demek ne xweş, dema şerê cîhanê yê duwemîn bû. Di wê dema ne xweş de jî, dîsan min perwerdiyek baş ji mamosteyên xwe yên cihû; Neumark, Swarts, Grozat, ku ji ber zilma nazîstan bazdabûn û li fakulteya huqûqê ya Stembolê profesorî dikirin, stend. Ez di sala 1950'! de mezûn bûm. Min heya 1953'an karê xwe yê eskeriyê û staja xwe ya avûkatiyê qedand. Hema piştî wê, ji bo doktora huqûqê ez çûm Parîsê. Min doktora xwe ya huqûqê di sala 1958'an de bi perên bavê xwe li Fransayê stend. Mijara teza min (dîroka malî ya Osmaniyan) bû. Di dema xwendina doktorayê de ez li pirtûkxaneyên Parîsê pêrgî pirtûkên li ser kurdan hatim. Ez hingî têgihîştim ku paşerojek vî gelî ya dewlemend heye. Nemaze gava min dîtibû ku gelek medeniyet ji dema antîk ji aliyê kurdan ve berpêşî mirovatiyê bûye, ez gelekî kêfxweş bûbûm. Tu bêjî nebêjî heta sedsala bîstan gelek medeniyetên din bingeha xwe ji medeniyeta gelê kurd stendine. Di dema me de gava Sumer, Hîtî, Asûr, Frigya, Lîdya asîmîle bûne û wînda bûne, di sedsala bîstan de gelê kurd bi hejmareke mezin derdikeve pêşiya me. Ev şanseke mezin e. Digel hemû neyînîyên hemdemî, hebûn bûyereke girîng e. Diviyabû ronakbîrên kurd cihokên xetimî vekirana. Ji ber ku gelê kurd, di maneya cografîk de, di warê kultur û bajarvaniyê de nema bû. Di wê dîrokê de li Tirkiye gotina »kurd« qedexa bû.

Behskirin û vekirina dîroka Kurdistanê jî bê îmkana bû. Min hingî biryara xwe da ku ez ê lêkolînên xwe bidomînim û di demeke hêsan de wan biweşînim. Di dema xwe ya xwendevaniyê de, ez li Parîsê tevî tevgerên şoreşgerî bûm. Ji bo liberxwedana gelê Cezayirê, min kar girtin ser milê xwe û bi vî awayî ez bi antî împeryajîzmbûna xwe bûme înternasyonalîstekî gerdûnî. Di sala 1959'an de ez çûm Norvecê û min demekê li wir xwendina kooperatîfî xwend. Min di derheqa kirinên dewletê, yê ku bi navê Sosyalîzma Skandinavya dihatin bi nav kirin, malûmat girtin. Ez di sala 1960'î de vegeryam Tirkiyê. Di 27'ê gulanê de, piştî darba hukûmetê bi sê rojan, ez ji aliyê wezîrê hundurkarî, ku teymenek bû, ji bo kurdîtiyê hatim girtin. Ev bûyera ha di jiyana min de ji bo min dibû tecruba dudan. Ez bi efuya ku piştî pênc mehan hat, hatim berdan. Gorî ku min di şeş saliya xwe de dest bi dibistana destpêkê kiriye, 27 salên min bi xwendinê derbas bûne. Lê digel vê keda me dîsan em di çavên dewleta Tirkiyê de hevvelatîyên dereca duyemîn in, muamela reşikan bi me tê kirin. Êdî em mîmlî bûn. Sûcê me jî kurdbûyina me bû. Ger em qet tişteki nekin û tenê li nasnava xwe ya kurdî xwedî derkevin, ew di çavên Cumhûriyeta Tirkiyê de sûcê herî mezin e. Di wê demê de, di nav çepên tirkan de behsa vê nasnavê kirin, weke şovenîstî û nijadperestî dihate dîtin. Yanî ji ber ku em kurd bûn, em li vê zirecêba dinyayê bi tenê bûn. Gava ez ji Ewrûpayê vegeryam bajarê zaroktiya xwe, Konyayê, min di bin şerdên zehmet de jiyana xwe bi avûkatiyê berdewam kir. Di eynî salê de ez bi jina xwe ya Norvecî û zarokên xwe ve li Norvecê bi cih bûm. Ez heya sala 1983'an li vî welatî, li bajarê Golê mam. Min xebatên xwe yê di derheqa medeniyet, dîrok û kultura kurdan de li vî bajarî hê xurttir kir. Piştî vê dîrokê ez vegeryam Tirkiyê.

Ez niha li îzmirê dijîm.

Nivîskariya min digihê salên dibistana navîn. Kurteçîroka min ya pêşî di kovara Arkadaş, ya ku li Stembolê diweşiya, derket. Di dema lîseyê de min û hevlekî xwe me bi rojnameya Babalik re pareka edebiyatê weşand. Ji ber ku me hê lîse neqedandibû, mafên me û derxistina rojnameyan tunebû. Me ji mecbûrî riya derxistina kovareke mehane hilbijart. Gava me bihîstibû tenê li îzmîrê 300 lib têne firotin, em şaş û ecêbmayî mabûn. Di wê demê de tîrajeke wilo pirr bû. Em gelekî kêfxweş bûbûn. Lê ev mijûliya me ji ber xebatên dibistanê zêde neajot.

Di sala 1951'ê de min li Konyayê rojnameyeke hefteyî bi navê »Bizim Şehir« derxist. Ev weşana me baleke baş kişandibû, lê gava ez çûm eskeriyê, dawiya weşana vê rojnameyê jî hat. Salên dûvre jî min nivîsandina kurteçîrokan domand. Çîrokên min di rojnameya Cumhuriyet, ktanbûl Çağrı, Varlık kovarên Tiirk Dilide belav bûn. Di salên 1959-1960'î de bi alîkariya wergerên jina min a norvecî, çîrokên min di kovarên norvecî û danîmarkî de weşiyên. Piştî salên 1986'an jî li bajarê Yugoslavya, li Oskiipê, çîrokên min di kovara bi navê SESLER ku bi tirkî çap dibû, weşiyên. Ji sala 1974'an û vir de ji ber ku min dev ji avûkatiyê berdaye, ez dema xwe bi nivîskariyê derbas dikim. Ez debara xwe bi kiriya xênî û bi perên avûkatiyê yê teqawîtê dikim. Berhemên ku min nivîsandine jî ev in: Giilen înek (Çêleka ku dikene) 1959, Karides Duragi (Rawestgeha Karîdesê) 1967. Ew çîrokên min yên ku ji aliyê wergêrên NÛDEM'ê yên hêja têne wegerandin, ezê di pêş de wan mîna pirtûkekê bi kurdî çap bikim. Ez nivîskarekî kurd im ku ji zimanê dayika xwe hatime birrîn û nikarim pê binivîsînim. Ji ber ku ez bi tirkî dinivîsim nayê wê manê ku ez ne (nivîskarekî kurd im). Di

pêvajoya dîrokê de edebiyata kurdî bi zimanê serdestan bi pêş ket. Ebû Muslum Horasanî, Ebû'l Vefa, Şihabedîn Suhreverdî, Abdull Kadîr El-Geylanî, Şêx Addî, B; Mîdsafir bi erebî nivîsandine. Di dema Selçûkiyan de Husamettîn Çelebî yê kurd bi zimanê resmî, farisî nivîsandiye. Seyit Nesîmî, ji şairên me yên dîwanê Nabiyê kurd û Fuzûlî bi erebî û osmanî nivîsandine. Di dema me de jî gelek şair û nivîskarên kurd bi zimanê resmî, bi tirkî nivîsandine. Ji xwe ev heftê sal in, ku nivîsandina bi kurdî li Tirkîyê qedexe ye. Lê ez nivîskarekî kurd im û ez bi vê jî serbilind im.

Berhemên din ku min nivîsandine jî ev in:

Iskandinavya'da Turizm (Li Skandinavyayê Turîzm) 1985.

Konya Sazi ve Tiirkûleri (Tembûra Konyayê û Stiranên wê) 1986.

Antolojiya ku li Yugoslavyayê bi navê-çîroka Tirkîyê ya do û îro, 1987.

Kiirt Tarihi ve Uygarlîgi (Dîrok û Medeniyeta Kurdan) 1991.

Kiirt Uygarlîginda Alevilik (Dt Medeniyeta Kurdan de ElewîrJ) 1991.

Kiirt Mutfak Kiilturii ve Kiirt Yemekleri (Kultura Kurdan ya Mitfaxê û Xwarinên Kurdî ) 1992.

Werger: Firat Cewerî

Li ser daxwaza me Cemşîd Bender ev kurtejiyana xwe di sala 1992'an de ji bo hejmara Nûdemê ya 4'an nivîsandibû. Tiştê em dizanin ji wê dîrokê û bi vir de sê pirtûkên wî yên din jî dêrketine. Ew jî ev in; 12 Imam ve Alevilik, Çattdaki Isaû Kiirt Mitolojisi.

Keça kurd Zengê

Gava ez ji malê derketim ez mîna barûdê bûm. Kuxuka Zengê

ya hetanî sibehê firsend nedabû min ku ez razê. Min bi

herdu destan bi kindira di stûyê xwe de girtibû û ez dimeşiyam.

Ev kuxuka zirav ku ji kûraniyê dihat, qet ne mumkun bû ku me

ew bida rawestandin. Şeva çû ez bi ser diya wê de çûbûm û ji bo

ku wê baş li zaroka me nenihêrîbû, min şîmaqek jî lêxistibû. Belkî jî rebena jinikê biheq bû.

Karê Xwedê ye. Xwesî û nexweşî di destê wî de ye. Ma çi gunehê min heye? wê bi girî gotibû.

Ji ber ku min êzing nekirîbû, wê ez sûcdar nekiribûm, ku keçik ji serma nexweş ketiye. Em ji derdê zarokan xelas nedibûn. Ev çend roj bûn ku kuxuka Zengêya biçûk dom dikir. Solên Meryemê jî tunebûn. Wê bi lingên xwe yên xwas pê li keviran dikir û dimeşiya, di nav avên mîna qeşayê de digeriya. Ji ber vê yekê ez bi diya wan re xeyidîbûm. Lê ma wê jinikê çi bikira? Di hundur de pênc zarok hebûn. Yek jî di zikê wê de bû. Dê li kîjanî ji wan binihêriya? Hemû nê dixwazin, kincan dixwazin. Kinc tunebin jî, em kincên yên mezin li yên biçûk dikin û bi wî awayî îdare dikin.

Li ser rêzekevîrên li kêleka rê, ji dengê hesinê binê sola min pê ve deng nedihat bihîstin. Yên ku ji nimêja sibê derketibûn, bi hev re dipeyvîn û diçûn. Dinya pirr sar bû. Ez li ber Salepgerekî rawestiyam. Ji qedeha ku wî dagirt keldûman difuriya. Mîna ku wê kezeba min germ bibe, min ew qurt bi qurt vexwar... Simîta germ di nava destên min de herifî. Ev xwarina pêşî ya birçîbûna min a ku wê hetanî êvarî bidomiya bû. Diviyabû min hinek pere kar bikira û ji bo malê çar nan bikiriya. Ev dihat wê maneyê, ku diviyabû min heştêsd lîra kar bikira. Lê karkirin! Min dixwest ku ez li berevajiyê wî jî bifikirim. Ji bilî wê di hesêb de dermanê ku min ê ji Zengê re bikiriya jî hebû. Diya wê berî bi du rojan ji nexweşxanê reçeteyek standibû. Perên min tunebûn. Ji ber wê yekê min ew hiştibû roja sisiyan. Yanî min ew hiştibû îro. Ez niha li bendî qismetê xwe yê sibehê bûm. Belkî şansê min vebûya. Wê Zengê ji nexweşiya xwe rehet bibe, em ê jî ji xwe re hetanî sibehê bi rehetî



razên. Doktorê nexweşxana zarokan "gava ku ew dikuxe, ew mîna dîkan bang dide" gotiye. Gava ku Zengê nikarîbû ji ber kuxuka xwe bi hêsanî bêhna xwe bistenda, wê dengên ecêb derdixist. Wê çaxê doktor gotibû ev bronşît e û derman nivîsandibû. Ji ber ku perên min tunebûn, ez neçûm dermanxanê û min li buhayê dermên jî nepirsî. Gava dermanfiroş destê xwe biavêje dolaba camînî, divê mirov tavilê peran bihejmêre destên wî. Kî dizane bê ew ê çend hezar lîra bixwaze.

Erebeyên textînî diçûn mazatê. Erebevanan lingên xwe li bin çongên xwe tewandibûn û li ser kîsên kayê rûniştibûn. Hespên jar bi hêsanî ew erebeyên vala li dû xwe dikişandin. Yê ku sibehan zû radibûn em bûn. Di vê saetê de, di van kuçeyên teng de, ji yê ku li dû bidestxistina nanê xwe bûn pê ve kes tune bûn. Yê ku nanê xwe bi hêsanî bi dest dixistin, hê ji wan re du saet mabûn ku ew rabûna ser xwe. Em jî dikarîbûn li malên xwe li bendî germbûna mazatê rawestiyana. Lê nedibû. Hêzeke nexuyayî em davêtin der. Gava em gihîştin mazatê Arif li ber dîwarekî rûniştibû û cigare dipêça. "Min do êvarî li qehwê bi kaxezan leyist. Ez miflis bûm" got. Bêhna wî teng bû. "Lê me carekê leyist. Careke din tobe be" digot. Lê belê wî ê dîsan êvarî riya qehwê bigirta. Ji çirka ku ew ji girtîgehê hatibû berdan ew neçûbû gundê xwe. Di pirseke namûsê de, jina wî gihîştibû birayê yê ku wî ew kuştibû. "Ez ê bi çi rûyî herim wî gundî? Ma ez yekî din jî bikujim? Xwedê neke" gava me nû hevdu nas kiribû wî ji min re gotibû. Ev e, ew jî nikarîbû biçûya gundê xwe. Kî dizane bê hê ew ê çiqasî din li vir şerpeze bibe. Min jê re gotibû here Almanya. "Almanya sûcdaran nagire" wî bersiva min dabû. "Miletê Alman yekî ji min çêtir nabîne. Tu vê yekê wekî navê xwe bizanibî." Wî qutiya xwe ya tûtînê

dirêjî min kir. "mîna dolmeyerê dagire, venekişe" got.

10

Me cigarên xwe pêxistin.

- Te qet sûc kiriye? wî ji min pirsî.

- Na, min bersiva wî da.

- Te sûc nekiriye çi ye, piştî ku karê te nakeve rê.

- Lê herkesê ku sûcan dike nakeve girtîgehê, min gotê. Min di xortaniya xwe de mirîşk dizîne, haya kesî negihîştê.

- Dizî ne tiştê baş e, Arif got. Ne karê mêran e! Dibe ku bi ya wî mêrxasî ew bû, ku min kêrek li mirovekî bixista. Di dema ku min cigara wî dikişand de, min nexwest ez erza wî bişikînim. Di eslê xwe de Arifpeyayekî baş bû.

- Em dîsan ji rewşa xwe şukur bikin. Yê rewşa wan ji rewşa me xerabtir in jî hene, min gotê û min mijara peyvê guhert.

Arif zikê xwe ber bi pêş ve derxistibû, ew mîna generalekî di nava mirovên ku selik û qufikên xwe bi cih dikirin de dimeşiya.

Ew bêxem dixuya. Lê ne xuyabû bê wî xema çi nedikişand. Erebevanên

ku erebeyên xwe kişandibûn kêleka rê, kîsên êm kişandibûn

serê hespên xwe. Em hemû li bendî kar bûn. Hespan li pişt

ereban lingên xwe ji hev kiribûn û dimîstin. Arif bi "Ev mirovên

ku tu dibînî! dest bi peyvê kir. "Hemû sibehê zû rabûne, em jî.

Pêwîst e em peran kar bikin", min bersiva wî da. Nexweşiya Zengê

hatibû bîra min. Rebenê mîna dîkan dikir. Rast bû. Doktor

rast têgihîştibû, ku nexweşiya wê bronşît bû.

Ew ê vê êvarê nan û derman biçûya malê. Ji sedî sed diviyabû

biçûya. Ez mecbûr bûm. Bi celebê din çenedibû. Piştî ku ez û

Arif li mazatê geriyan, em heya bi garajê çûn. Garaj tijî otobiis û

kamyon bû.

Salepfiroş û simîtfiroş li vê derê jî hebûn. Kamyonên bar berepaş diçûn, muawînan bi qêrîn ji şofêrên xwe re digotin: "Çep here, rast here". Me çavên xwe li xwendevanên ku bi nivînên xwe li ber dîwêr rawestiyayî û bajariyên ku bi baholên xwe yê textînî û mezin, ku wê biçûna hotêlê, digerlandin. Lê belê dem gelekî zû bû. O ji bo mînubusa ku ji bajêr bihata jî diviyabû em du saetan rawestiyana. Arifxwesbîn bû. Ger ku wî heqê xanê û heqê nanê rojê derxista,

ii

ew li tiştêkî din nedifikirî. Ger te hemû dinya bidaya wî wî ê bigota ez naxwazim. Lê piştî ku ew bi ser lîska kaxezan vebûbû rewş hatibû guhertin. Wî bi dîqet li der û dora xwe dinihêrî, li yekî ku bangî barkêşan bikira digeriya. Her ku diçû em herdu bê sebir dibûn. Em ber bi mazata karkeran ve meşiyar. Ji bo dîtina kar erebeyên textînî jî vir de û wê de digeriyan. Erebevanên ku li ser kî-Sên kayê çarmêrkî vedabûn, rê girtibûn. Kamyonan bi zorê rê ji xwe re vedikirin û ber bi pêş ve diajotin. Dengê çêrên şofêran dihate bihîstin. Bîsîklêtên sêteker li ber dikanan bar datanîn. Barkêşên van bîsîklêtan dijminên me yê sereke bûn. Kara wan ji ya me bêtir bû. Her ku dibû derengê rojê, cih li barkêşên bi werîs teng dibû.

Arif "Em nikarin bi van re qayîşê bikişînin, ya baş ew e ku em jî peran bidin hev û ji xwe re bîsîkletêkê bikin" got. Lê belê wî bi xwe jî dizanîbû ku kirîna bîsîklêteke wilo bêîmkan bû. Di vê navê de yekî ji milê rastê "Barkêş" bang kir. Em herdu bi hev re li wî dengê zîvirîn. Bi holbûnekê re me destê xwe avêt sindoqa wî. Ev bi dozîn bûbû. Sindoq mîna keweke ku nuh hatibû girtin di nava destên me de bû. Min û Arifme li çavên hevdu nihêrî. Wî li min û min jî li wî mêze kir. Lê destên me li ser sindoqê bûn. Kê ji me

destê xwe ji sindoqê berda, ew ê sindoq bibûya ya yê din. Min carekê kir ku ez destê xwe jê berdim, lê Zengê hat bîra min. Min dîsan xwest ku ez bi sindoqê bigirim. Lê ez dereng mabûm. Arif "Vê biavêje pišta min" got. Min wek wî kir. Arif di bin wî barê ku bi kêmanî sed kîlo bû, bi sorahiya xwîna ku hilperikî mêjiyê xwe dilşa bû. Ew bi mirovê xwediyê sindoqê re meşiya û çûn. Ez bi tenê mabûm. Herkesî baz didan qismet û nesîbên xwe. Piştî ku min kindira di serê xwe de pîva, dîsa ez ketim nava qerebalixê. Erebevanê xwediyê erebeyên vala her li kar digeriyan. Em hemû li navê bûn. Tiştê ku nedibû çî bû? Ez nizanim bê ez çiqasî geriyam. Zikê min dîsan vikîvala bû. Ez baş birçî bûbûm. Lê min dikarîbû li ber birçîbûnê debar bikira. Her ku ez li Zengê difikirîm, ez li hemberî birçîbûnê bi hêztir dibûm. Ez niha li ber lampeyeke trafîkê ya sor pêketibû sekinîbûm. Min dît ku şofêrê kamyonê kevin destê 12

xwe di pencerê re ji min re li ba dike. "Xwe biavêje dawiyê" got, "Em ê malê bar bikin, zû, berî ku lampa kesk pêkeve".

Çûkê bêhtengiyê tavilê ji dilê min firiyabû. Min xwe hema bi carekê ve avête erebeya kamyonê. Em di çarşiyê re derbas bûn û çûn. Em ketin nava mehelan. Em li ber maleke bi tenê, ya li pişt baxçeyekî zarokan sekinîn. Şofêr xwe ji kamyonê avêt xwarê. Li ba wî yekî ziwa, jar û bêçakêt hebû. Ew jî daket. Demekê li ber derî sekinîn. Paşê em hemû bi hev re derbasî hundur bûn. Herçar aliyên me tijî firax bûn. Pêşî min û wî peyayê jar me xalîçeyên li erdê dane hev. Wî du heb ji wan avêtin kamyonê. "Hevalo, çênabe ku mirov xaliyan deyne binî. Em pêşî mobîlyan biavêjinê. Em ê van bi ser wan da kin" min gotê. "De here lo" wî got. Ez çûm. Tekneya kamyonê di tozê de mabû. Min xalî li quncikekê bi cih kir.

Min ê pişta sarincan bisparta van xaliyan. Paşê wî peyayê jar bi a min kir, me pêşî sarinc bi cih kirin. Şofêr diket hin odeyan û derdiket, wî qet alîkariya me nedikir. Paşê wî ê karê xwe xelas kiribe loma ew hat ba me. Wî bi hemû hêza xwe hewl da ku alîkariya me bike. Min dizanîbû ez ê di vî karê malbarkirinê de tibabek pere bistînim. Edî Zengê xelas bûbû. Gava min dolaba camînî dibir ez li vê difikirîm. Hê ew dolaba camînî li pişta min bû, min got gelo ew reçeteya ku doktor daye, bi min re ye an na. Xwezî min negota. Ger ew dolaba camînî ne li pişta min bûya min dizanîbû bê min ê çi bikira. Bi namûs min dizanîbû. Me ewqas sal ji bo welêt û gel eskerî kiribû.. Ma me çi kiribû? Dolaba camînî li pişta min bû. Min kindir di ser re avêtibû û ew baş girê dabû. Heta wê çaxê sêlikeke gramafonê jî neşikest. Min carekê dît ku ji aliyê baxçeyê zarokan du-sê kes ber bi me ve baz didin. Şofêr û wî peyayê jar hema xwe avêtin kamyonê û pê li gazê kirin. Ez têngihîştim bê çi dibû. "Hela rawestin hê dolab li pişta min e. Ma hûn ê min bihêlin û bi ku de herin? Deriyê malê vekirî ma." Lê kamyon rabû û ji wir bi dûr ket.

Ji ber ku dawiya kamyonê vekirî bû, dolaba têlînî gindirî erdê. Ew gindirî, lê wan kesên ku ji aliyê baxçeyê zarokan ve baz didan, dora min girtin. Di bin bar de rûyê wan nedihate ber çavên min.

13

Min kulma pêşî di bin dolabê de xwar. Dolab bi milê çepê de şemitî. Ez jî pê re ketim. Dengê şikandina caman hate min. Ez bi ser kêlekê de ketibûm. Pekîneke bi hêz li sînga min ya vekirî ket. Qolinceke bêtarîf hatibû zikê min yê vala. Hê jî min fêhm nekiribû bê ew ji bo çi li min didin. Ji derbeyên ku miri dixwarin min firsenda peyvê jî nedidît. Ji der û dorê bi koman mirovan ber bi

me ve baz didan.

Dengê qêrîn û qerebalixê zêdetir dibû. Carekê min kir ez rabim ser xwe, lê pehînek li nava pozê min ket. Ji ber ku min dizanîbû her ku ez tevbilivim ez ê lêdanê bixwim, ez demekê qet tevnêliviyam. Yên ku hatibûn carina di deriyê vekirî re diketin hundur, lê dîsan berepaş vedigeriyan û dihatin ba min. Kindira ku sist bûbû min berda. Dema rabûnê bû. Yekî bi milê min, yekî jî bi stûkura min girt. Min niha der û dora xwe hê çêtir didît. "Dîqet bikin bila ew nereve!" Ez raste rast di nava xerabiyekê de bûm. Du mirovên mêrxas yên ku dixwestin qanûnên civakê yên ku dihate zanîn biparêzin, stûkura min bernedidan. Hinan ji wan tif dikirin rûyê min. Demekê min xwest ez bipeyivim. Yê ku hêrs bûbû kulmek di nava piştê min de lêxsit. Ez dîsan ketim xwarê. Kaxezeke spî ji bêrîka min ketibû. Ev reçeteya Zengê bû. Zengê hetanî sibehan dikuxuya. Doktor gotibû bronşît e. Min xwest ez destê xwe dirêjî kaxezê bikim. Peyayê ku bi stûkura min girtibû ji min re bû asteng. Wan ez dehfdam û xwestin ku min bibin cihekî nenas. Her ku em dimeşyan, qerebalixa li dora me zêdetir dibû. Komeke zarokan xwe di nava qerebalixê re rakir û xwestin bi tirs min bibînin. Em li kuçeyekê zîvirîn. Em di kuçeyeke teng re derbas bûn û ketin ser riyêke fireh. Ev rê tijî erebeyên textînî, fayton û kamyon bû. Mirovên ku ji dikanan tişt dikirîn, derdiketin ber devê dikanan û li me dinihêrîn. Her ku em diçûn yên ku dihatin temasekirina me zêdetir dibûn. Min komê mirov li dû xwe dikişand. Xwîna ku ji pozê min diherikî, di ser sînga min re diherikî jêr. Em dimeşyan. Zarokên biçûk û şêrîn, şagirtên dibistanan bi tirs li rûyê min dinihêrîn. Peyayê ku bi milê min girtibû "min ew girt" bi qêrîn ji der û dorê re digot û xwe pê qure dikir. Ferqa min ji hey-

wanekî kovî ku li daristanê hatibû girtin qet tunebû. Min demekê xwest ku ez li ber xwe bidim. "Bimeşe, bimeşe" gotin û li paş stûyê min xistih. Ez êdî di nava destên mirovên dilpak de bûm. Ez êdî ne aydê xwe bûm. Ez ewqasî ji xwe bi dûr ketibûm, ku niha di bêrîka min de pere jî hebûya ez nikaribûm bi çar nanan û bi qutiyek derman vegeyriyama malê. Wê zarok û diya xwe li bendî min bimana. Min nikanîbû bi awayekî haya wan jî bigihandayê. Danûstandinên

me dihatin birîn. Ew ê di nava civatê de gêr bibûna û biçûna. Edî wê kuxuka Zengê ne aydê min bûya. Wê jina min jî êdî ne ya min bûya. Ji aliyekî ve ez xelas bûbûm. Her ku diçû van tiştên han di mêjiyê min de cih digirtin. Encama vê yekê ken bû. Min pêşî li zarokên biçûk û paşê jî li pîrejinana nihêrî û ez keniyam. Ez paşê bi şûşên şîr û bi pakêtên cigaran keniyam. Min serê xwe yê bi xwîn zîvirand û ez bi peyayê ku bi milê min girtibû keniyam. "Kûçikê bê ar hê jî dikene" gotin û bi gurmistan bi serê min ketin. Ji ber wê lêdana wan ez bêhiş ketim. Gava ez dîsan hatim ser hişê xwe min dît ku çend kesan bi lingên min girtine û min bi dû xwe de dikişkişînin. Serê min bi erdê ve dikişiya. Em hê jî negihîştibûn wî cihê ku wan dixwestin min bibinê. Edî min ew qerebalixa ku rê dagirtibû nedidît. Çakêtê min jî ji min şeqitî bû û di nava lingan de çûbû. Ya girîn di navê de mirovatiya min hebû. Ew jî di destên nenanasan de bû û bi dû xwe de dikişkişandin. Gava serê min li keviran diket, di dilê min de xwestekeke xewê ya bêsinor hişyar dibû. Min jî wilo kir. Ez bi dû stêrkên ku li ber çavên min difiriyan ketim. Bi lingên xwe yên dirêjkirî, ez ketim xeweke kûr.

Werger: Firat Ceweri

15

Tivinga rênçber

Wek îro tê bîra min. Ew lawikekî zerik û zeyifokî bû. Çavên wî yên keskê vekirî di pişt berçavka wî ya çarçeve qalind de melûl û fikirtijî bû. Em zarokên kurd yên xwas bûn. Bavên me ji ber şer hatibûn li vî bajarî bi cih bûbûn. Ji ber ku gotina »kurd« qedexe bû, wan ji me re digotin zarokên mahciran. Em xwas bûn, lê lawê mufetîş hertim bi solên xwe yên boyaxkirî digeriya. Kincên wî jî nû û xweşik bûn. Me ji xwe re ji ziravşaxên spîndaran pîspîsk çêdikir, lê lawê mufetîş ji xwe re pîspîskeke bekçiyar ji bajêr kirî bû. Di lêgerîna çûkan de ku em winda bibûna, bi lédana pîspîska wî em tavilê dihatin ba hev.

-Binerin, va lawê mufetîş sax e, me digot û heya ku ji me dihat me li pîspîskên xwe dixist.

Wî, şaxên daran dida alî û bi berçavka xwe ya ku dadiket ser pozê xwe ve bi bêhnçikandinekê ve xuya dibû.

Ew rez, fêkiyên bê xwedî û çûkên ku difiriyan hemû di bin emrê me de bûn. Em weke dewriyan heya aşê avê li gelî digeriyan, em bi giran ve radipelikîn, em li wî cihê ku jê re digotin «Zinarê Keçikan» rûdiniştin, me bêhna xwe berdida, me li hêşnahiya li derveyî bajêr temaşe dikir û em vedigeriyan. Kûçikên şivanan yên bê xwedî dihatin me û em derbasî aliyê rê yê din dikirin. Lawê Mufetîş zû bi zû nedikeniya. Ew hertim difikirî. Gava em bi hev re diketin qayîşa avêtina kevirê kefkaniya, wî ji bêrîka xwe kovareke zarokan derdixist û dixwend. Gava yekî ji me ji yê din dûrtir davêt û lawê Mufetîş jî ew serketina han ferq dikir, me di bin çavan re li wî dinihêrî. Wî guh nedida tiştên wilo, lîstikên me bala



wî nedikişandin.

- Binêrin, binêrin, axayê we Smaîl bûye yekemîn, îsmaîl digot û tepik li sînga xwe dixistin.

x6

Lawê Mufetîş ji ber van kirinên îsmaîl guhên xwe miç dikirin, ew wer ku aciz dibû, wî nedixwest ew bûyerê bibîne.

- Navê te ne Smaîl e, îsmaîl e, birawo, digot û nizanim wî çend caran şaşıyên lêwik rast dikirin.

Di şûna gotina îbo de, ez gotina îbrahîm ji wî hîn bûbûm. Ji ber rastkirina van şaşıyên me bûn, ku lawê Mufetîş em li dû xwe dikişandin. Ji bo şikandina forsa lawê Mufetîş ne derketina îsmaîl ya zer Zinarê Keçikan, ne jî li ser riya bitoz bîst û pênc gavan meşa wî ya li ser destan pere kir. Min jî bi terriya wî marê ku min ew berê bi dar gêj kiribû, girt, hejand û avêt. Lê ji bo şikandina forsa wî wê yeka han jî pere nekir. Em hersê zarokên wek kerpîçên Meramê yên şewitî, qemer, me çî kir jî, dîsan lawê Mufetîş hêdî, lê bi hostetî em dixistin xefka xwe û em bi xwe ve girê didan.

Her ku hevaltîya me bi pêş diket, rojên nû ji wî re serfiraziyên nû tanî. Ew zarokê bîaqil bû. Her gava ku wî davêt, her tevgera wî weke resimekî mozaîkî ku ji perçekevîrên biçûk pêk hatibû, ew serfiraziyên wî dixemiland. Di dirêjahîya demsalek havîna bi ber de, em rojekê li bin darekê rûniştî bûn û me riya lawê Mufetîş dipa. Wî hez dikir ku em li bendî wî bimînin. Ew dereng hat. Tiştê di destên wî de bû. Gava ew nêzîk bû, em têgihîştin ku ew tiştê di destê wî de tivingek e ku devê wê bi darikekî bi ben xetimandiye. Ez, îsmaîl û îbrahîm lastîkên me yên çûkan di destên me de û em sar mabûn.

Weke ku îbrahîm ta girtibe, »Em ê niha çî bikin, em ê çî bikin?

« got. îsmaîl jî piştî ku ew buxuşkên berî bi kurtemekê dabûn hev, xist bêrika xwe, ji bo ku ew qusûrekê bibîne peyivî:

- Lê ev tiving çûkan nakuje.

Lawê Mufetîş jî,

- Ev ne ji bo kuştina çûkan e, got. Ger bavê min bibihîze ku ez çûkan dikujim, ew ê bi min re hêrs bibe.

îsmaîl bi ken, weke ku bawer nekir,

- Ger bavê wî bibihîze ew ê hêrs bibe, bi zarpêkirinê got.

Lawê Mufetîş henekê xwe bi devê îsmaîl kir,

- Mirov gotina »bav« wilo nabêje.

17

Ji bo ez liberxweketina îsmaîl nebînim, ez çûm ser kehniyê da avê vexwim. Di vegerê de mîna ku îsmaîl hisên xwe yên sûcdar veşêre, ew rabûbû ser herdu destên xwe û ber bi îbrahîm ve diçû.

Ji bo ku ew xwe ji solên wî yên bi toz biparêze, wî hêvî dikir, ku ew jê bi dûr bikeve. Ew yeka han qet ne xema îbrahîm bû, wî bi destên xwe îsmaîl dehfda û ew xist erdê. Paşê ew hat ba min, mîna ku wî fikrek din kivş kiribe, bi hêsanî û bi dilşahî got:

Em jî ji xwe re ji şaxên daran tivingan çê bikin. Bila her yek ji bejna me dirêjtir be.

Baş e îbrahîm, em çê bikin, min jî got.

Lawê Mufetîş li mêrgê rûniştibû, tivinga wî li ser çonga wî bû û kovara xwe ya zarokan dixwend. Wî qet guh nedida me. îsmaîl herdu destên xwe mîna baskên çûkan kirin, li herdu hêlên xwe xistin, hat ba me û tevli biryara me bû. Lê me nikarîbû serê lawê Mufetîş ji ser wê kovarê rakira.

Haziriya me du rojan ajot. Min ji malê ben, bizmar û hin tiştên din anîn. Min lastîka xwe ya çûkan bi herdu hêlên tivinga xwe ve

bizmar kir. Qet nebe ew buxuşkên ku min ê tê de bi cih bikirana, min ê çar pênc metre biavêtana. îbrahîm û îsmâîl jî niyet û zemanê xwe yê baş dane vî karî.

Gava gundiye ku genimê xwe dibirin êş di wir re derbas bûn, Çi ye zarokno, ma hûn haziriya şer dikin, gotin. Lê lawê Mufetîş qet li me hayî nedibû.

Yê me em bi çêkirin û duruskirina aletên xwe ve mijûl bûn, lê lawê Mufetîş bi tenê carinan destmalkeke pakij ji bêrika gomlegê xwe ya biçûk derdixist, pê camên berçavka xwe pakij dikir, paşê dîsan berçavka xwe dida ber çavên xwe, bi pozê xwe ew çend caran ber bi jor ve hildida. An jî kêzika ku wî dikuşt, gula ku wî jê dikir, datanê kêleka xwe û ziq lê dinihêrî. Her tiştên ku bala lawê mufetîş dikişand, wî dixwest wan di çav re derbas bike.

Heçê ez bûm, min di hundirê xwe de heq dide îbrahîm, ez difikirîm ku «hê ev lawik wê çi bîne serê me» Lastîka min ya çûkan ji bizmarên qalind, birînên mezin xwaribû. Di ser re jî bi kutana keviran, min ew ji hev perçe kiribû. Ji bo min gelekî zehmet bû ku

18

min ji xwe re lastîkên nû bikiriya. Ew pereyên ku wç bavê min bidaya min ji bo eydiyê bû, lê hê ji eydiyê re sê meh mabûn.

îbrahîm jî ew neynika biçûk a girover, ya ku ji malê dizî bû, bi qevda tivinga xwe vekiribû. îsmâîl jî tivinga xwe bi morîkên biçûk û rengîn xemilandibû. Em westiyayî, ji haldeketî û perîşan bûn.

Roja ku me ê ji lawê Mufetîş re bigota, »Êdî va ye tivingên me jî hene« wê rojê wî tivinga xwe ya xweşik, delal û malê fabrîkê neanîbû.

Me jî li serê çem, li binê darê, mîna leşkerên ku her havîn ji bo talîmê dihatin, tivingên xwe spartibûn wir, em li dora wan diçûn û dihatin û em li bendî lawê Mufetîş bûn. Me digot, gelo ew

ê bibêje «çawa jî tivingên xwe spartine wir».

îsmaîl lîka ku ji pozî xwe diherikî dikişand û nanê xwe yê bi rûn dixwar. îbrahîm jî weke ku ji min hêrs bûbe, behsa serpêhatiyek xwe ya do kir. Di wê navê de, lawê Mufetîş herdu destên wî li paş qûna wî bûn û ket nav me, bêî ku ew tişteki bibêje, derbasî ba tivingan bû û di ber wan re çû û hat. Em li dû mabûn. Ji bo ku em bimeşin û herin ba tivingên xwe, me li çavên hevdu nihêrîn. Qêrîna pêşî ji îbrahîm hat. Tiştê ku digot nedihat fêhmkirin, lê pehînek li tivingên me yên ku me spartibûn wir, xist. Êşa lingên wî yên xwas qet ne xema wî bû. Wî bi wê yeka han dixwest xwe têxe çavên lawê Mufetîş, ew êdî derbasî aliyê wî dibû.

îbrahîm,

- Wî lawê qehpê neynika min şikand, bi qêrîn got. îsmaîl û îbrahîm bera ser piştê hevdu dan û lawê Mufetîş derbas kirin. Piştî kurtedemekê îsmaîl kete xwarê û îbrahîm jî bi kulma li devê wî xist. Ji bo ku hemû keda min bi erdê ve neçe, min tivinga xwe ji nav tozê hilanî. Ez li dû hemûyan dimeşiyam. Gava îsmaîl xwe ji girî li erdê dixist, îbrahîm zivirî û hat ba min. Du pehîn jî li zikê lêwik xistibû. Ji tirsê ku wê îsmaîl zixurên di bêrîka xwe de bavêje wî, wî xwe davêt pişt min.

Me îsmaîlê ku digot «Ay yadê tihêla min, ay yadê tihêla min» derbas kir.

Gava ku tu talûke nema, mîna ku îbrahîm bêje yê sûcdar lawê Mufetîş e, ev zarokê ha li hember Xwedê derdikeve yaho, got.

19

Min got ez ê jê bipirsim, bê ka ew ji bo çi li hember Xwedê derdikeve, lê min nepirsî. Wî dixwest wî lawikê ku şexsiyeta wî dipelçiqand, bi Xwedê re bike dijmin, da ew bi xwe rehet bike. Lê qet

ne xema lawê Mufetîş bû. Min li berketina îbrahîm zû fêhm kir. Ji bo neynika girover wê diya wî, xaltiya Miyasê lêxista. Ji ber ku ew neynika bavê wî ya rihkurkirinê bû.

- Gava min darê tivingê çê dikir, min gwîzanê wî bi kar anîbû, min ew ko kiribû, niha jî va ye me neynika wî şikand. Pîr xerab e, digot.

- Ma neynika we ya konsolê tune ye? min jê pirsî.

- Heye, lê bi dîwêr ve ye, got.

Îsmâîlê ku ji bo carek din lêdanê nexwe û têra xwe ji îbrahîm re xeberan bide, bi qederê deh panzdeh gavan li dû me mabû.

- Baş bû, baş bû, got.

Ew meşa wê roja bi bahoz wilo derbas bû. Heya ku lawê Mufetîş hilkişiya ser Zinarê Keçikan û li wir rawestiya, bêhna wî diçikîya.

Yê min jî tivinga min di destên min de bû û ez çûm ba wî.

Ev cara pêşî bû, ku piştî pevçûnê îbrahîm û îsmâîl dihatin ba hev. Dijminatîya hev ji bîr kiribûn, bi hev re dikenîyan.

Min di dilê xwe de digot: «Ji ber ku lawê Mufetîş westiyaye, ew rawestiyaye».

Lawê Mufetîş cihê ku pê ve hilkişiyabû, nîşanî me da,

- Gava mirov bi serkêş ve radipelike, erd nêzîktirî lingê mirov e.

Ji ber vê yekê diviyabû, mirov ji meşa li ser erda rast hindiktir biwestiya.

Lê ne wilo ye, ji bo çî gelo?

Îsmâîl destê xwe bir ser eniya xwe û xurand.

Wî tenê dixwest nîşan bide ku ew difikire. Heçê îbrahîm bû, ew ji mêj ve bi çûyina zora xwe razî bû. Neynika wî şikestibû. Wek ku ew mecbûr bû ku tişteke bigota,

- Werin em herin qereqola Meramê û em ji wan bipirsin, got.

Ew hukûmet e, ji me çêtir dizane.

Wê nêrîna îbrahîm a ku di rojên teng de xwe disparte peyayên dewletê ez diêşandim. Min di wê navê de li lawê Mufetîş jî nihêrî, ka bê ew jî hêrs bûye an na. Ew difikirî. Ew di nav fikreke ku niuo karîbû jê derketa de dipelçiqî. Bi destê xwe çenga xwe ya zer difirkand, bi pozê xwe berçavka xwe ber bi jor ve dibir. Paşê bi carekê ve rûyê wî fireh bû. Wî em carek din jî ji bîr kiribû.

- Ez ê herim ji bavê xwe bipirsim, got. Wî xwe weke birûskê ji serê kêş berda jêr û di nav deviyên de winda bû. Em di zirecêba dinyayê de bi tenê mabûn. Ji bo ku îsmaîl xwe ji hêrsê vala bike,

- Gava ez bi girik ve bi hewa kevim, ez ê biwestim, newestim, ji te re çî kûçik lawê kûçika, got.

Weke ku îbrahîm jî heq bide wî,

- Em nikarin bi vî lawikê re qayîşê bikişînin, em lawê rênçberan in, wî gotina bavê xwe bi bîr anîbû.

Rezên Meramê li pêş me dirêj dibûn. Pale bi bêrên nav milên xwe ve di şiveriyên jêr ve derbas bûn û çûn. Ji bo ku em jî derdê xwe ji germa ku lingên me yên xwas dişewitand re, bibêjin, em çûn ser çem. îbrahîm û îsmaîl ketin avê, ez jî li ser pira textînî rûniştim û min lingên xwe yên bi toz xistin nav ava sar.

Werger: Firat Ceweri

21

Xvtrîn

»Je ne veux pas voir je sang« Serrano şîîra Lorca dixwend. Lorca ew şîîra xwe ji bo hevaleyê xwe, yê matador, ku ji aliyê ciwangeyekî har ve hatibû kuştin, nivîsandibû. Ji her gotineke şîîrê xwîn dipijiqî, gotinên bi dû de dihatin jî dîsan bi xwînê dihatin xemilandin.

Serranoyê spanyolî berê xwe dida welatê xwe, yê ku bi kîlometreya li dû xwe hiştibû. Piştî malika pêşî ya şîîrê wî bêhna xwe

berda. Xuya bû şerê Spanya yê hundir hatibû bîra wî. Artêşek esker di bîbikên çavên wî de dimeşiya. Bi emrê general girtin ser mala Federico Lorca. Wê şair bi şîrên xwe yên humanîst ve bihata gulebarankirin. Wilo jî bû. Çend gulle li azadiya wî hatibûn reşandin. Xwîna ku ji dilê wî yê pak herikî bû, li erdê belav bûbû.

»Je ne veux pas voir le sang« Serranoyê westiyayî got. Wî çavên xwe yên bi xumam firkandin.

Li dor masa xwarinê em çar kes bûn. Tchenê vîetnamî qet nedipeyivî. Şîra ku Serrano dixwend ew ajotibû kûraniya fikran. Bîranînên Tchen yên ku li erdên birincê hatibûn reşandin hebûn. Rûyên termên ku heta nêvî di nav ava pirrikî de, bê mane ber bi asman ve bûn. Gulle ber bi çîyan û daristanên kesk ve difiriyan.

Dengê makînan newalek dadigirt. Te digot qey Tchen jina xwe, zarok di dest de, ji xaniyekî ku dişewite derdikeve, dibîne. Jinik bê rohnî direviya. Paşê ew terpilî û ket xwarê. Ew birîndar bûbû.

Xwîn ji devê wê dihat. Tchen çavên xwe girtin. »Bêşerefno« got. Paşê bêdeng ma. Aciz bû. Lê ji bo ku ew xwe ji wan dengên makînan rizgar bike şorba xwe xwar.

Serrano ji cihê ku mabû dewam kir. »Je ne veux pas voir le sang« got. Ji her gotinekê dîsan xwîn dinuqutî. Te digot qey ciwangeyê har ji bo ku qulonçê xwe rind lê bixe berepaş diçû û li nêçîra xwe temaşe dikir. Ji aliyê din ve jî dîsan refek esker gulleyên

i2  
mirinê ajotin ber tivingên xwe.

Giraniyek daketibû ser sifra me. Te digot qey berpirsiyarê van şaşîyan em bûn. Di hêwana xwarinê de grûbên cihê cihê bi dengê bilind dipeyivîn. Piştî ku grûbeke şên ya fransîzan şeraba xwe bi ser xwe da kirin, dest pê kirin û perçeyên nê avêtin maseyên din.

Ne xema kesî ji wan bû.

Mirovê sêyemîn, Henicheyê cezayirî bû. Wî nuh şorba xwe qedandibû.

Wî hertim bi lez dixwar. Mîna ew li kesî guhdarî nake

dixuya û rojnameya Le Mond ya ku li ser çongên xwe bi cih kiribû,

dixwend. A rast hişê wî baş li şîra Serrano bû. Wî gotinên şîrê

di serê xwe de dibir û tanî. Li Telemcanê, Oranê, Algerê ji nû

ve bombe teqiyabûn. Du welathez li giyotînê razandibûn. Bi koman

zarokên bê kes û jinan ber bi Tunisê ve koç dikirin. Nîvê

wan di rê de mabûn. Ji bêhnan mirov nikarîbû di ser çîyan re derbas

bibûya. Fransizan du gund ji kokê de şewitandibûn. Serê Henich

jî ber bi jêr bû, rojnameya li ser çongên wî şemitî û kete xware.

Serrano bêhnaxwe digirt û berdida. Ew westiyayî gihîştibû dawiya

şîrê. Wî guh nedida me kesî. Lê me ew gotinên ku di cih de

hatibûn bikaranîn zebt dikirin, te digot qey ew xwîna ku bê rawestan

diherike, ji damarên me der dibû. Erê, ew xwîna ku bê

navbir ji şîrê diherikî xwîna me bi xwe bû. Gava wilo bû Serrano

guh nedida me. Ew bi Lorca re di nava şîrê de bûn. Di her gotina

»Je ne veux pas voir le sang« de axîn dikişand, diheliya. Weke ku

hemû şaşiyên ji dîroka mirovatîyê û bi vir de hatibûn kirin em

berpirsiyar bûn, me bi stûxwarî uzra xwe dixwest. Serrano em nedidît.

Wî xwe dabû têkoşîneke hundirê xwe.

Şîr xelas bûbû. Serrano bi navberr dikuxuya. Wî destê xwe yê

ku di binê masê de veşartibû hêdîka hilda jor. Destmala ku bi destê

xwe ji hev vekiribû bir ber devê xwe. Destmala spîboz li ber çavên

me sorîkur bû. Serrano xwîn dikuxuya. Wî serê xwe bi hemû

bêhêziya xwe bera jêr da. Paşê ew bi ser masê de ket.

Garsonê ku surehiya me nû kir, pêşî ji nalîna Serrano ya li hemberî

sê kesan tişt fehm nekir. Ji ber ku em di rawestîneke bi hur-



23

met ya bê tarîf de bûn. Me bi her tiştî dizanîbû. Garson serê xwe ber bi Serrario ve tewand, ew xwîna ku ji destmalê diherikî dît. Paşê ji bo ew bang doktor bike ji ba me baz da û çû. Çiyayên Alperê li hember me bi rêz dibûn. Senatoryuma unîversîta Touvet ya St. Hilaire li geliyekî, li ser zinarekî bilind hatibû avakirin. Me ji hêwana xwe ya xwarinê, kanîbû kendalê ku heştased metreyî biiind, bi hemû spehîtiyên wê yên kovî bidîta. Bajaranî li vir bûbû mal, derbend, elektrîk, rê û av bi piştan ber bi gelî ve daketibû. Çemê îsere mîna xeteke zîv ew gundên ku ji huzûrê pê ve tu nesîbê wan tunebû, kom bi kom ji hev vediqetandin. Dibû ku niha li daristana kesk ji çûkên ku dixwînin û ji jin û mêrên ku ji hev hez dikin pê ve, tişteke tunebe. Gul û dar bi spehîbûneke bê sînor geş dibûn.

Werger: Firat Ceweri

24

Serlêdana azadiyê

Li vê cîhana xerîb mirin deynê stûyê me ye; ew bi qasî ava ku em vedixwin û xwarina ku em dixwin nêzîkî me ye. Ew carinan dikeve xewna mirov, em dibêjin xewna tirsê, roj tê ew dibe zîwan li baxçeyê me yê bi rêk û pêk di nava gulên me yên herî xweşik de geş dibe; reng, şikil û pergale xerab dike. Bila xerab bike. Ma kîjan gul bi ser demsala xwe ketiye? Ji bo zewqa çavan reng sêçar mehan tezetiya xwe vedişêrin. Bila veşêrin. Gava were ser zewqa zimên, tehma dêv, çaya wî, qehweya wî, lezeteke nesitewyayî di dêv de dihêle. Bila bihêle, di hemû kurtedemê de. . . Dawî, binketin! Tenê riyek heye, ew jî tunebûn e. Tunebûn çiqas rastiyeke vekirî ye. Ji nebûnê bûyîn, ji bûyinê nebûn. Ev ne henek e, tu ji ku

tê, tu ê bi ku de herî?

Em du bira bûn. Maleke me ji kelpîçên ku ji rojê qemirî bû, hebû. Ew çi saxlem bû jî! Hewşa axurê ku ji bapîran mabû, ji heywan, gîha û gênim re dibû. Gava du quwetên me yên kenok dikete nava tene, hewş tije dibû. Em mîna şêran bûn. Diya me, »destên we derd nebînîn« digot. »Zarokên min derd nebînîn. Bila yê ku barê we jî hilgirin, hebin! Bila zarokên we jî genimê we li ba bikin.«

Bavê me jî hebû; wê çaxê sax bû.

»Axa ku hûn destên xwe davêjinê, di destên we de bibe zêr,« digot.

Di vê navê de çi zerara wê heye ku ta û deziyê me kevin bûne.

Me xwe daye huzûrê. Di dilên me de mîna nanê germ şahiya jiyanê dipijiya. Em rehet bûn û em her dem birçî bûn. Ji birçîbûna me re sifreyên huzûrê dihatin raxistin. Em dilşa bûn. Em li ber kêmaniyên xwe nediketîn. Di navberê de dilşahiya jiyanê hebû. Ger

15

li diya me baran bihata guh nedidayê. Ew qelender bû. Sîwana wê tune ye, xem nake. Wê baweriya xwe bi zarokên xwe yên mîna şêran dianî.

Ger asmanekî mala me hebûya em roja wê bûn. Di hewayên bi ewr de, me herdu bira bi destên hev digirtin, me mîna bê zehmetî dimaliştin. Herçî bavê me bû, wî cigare nedikişand. Lingekî wî kulek bû. Di hemû jiyana xwe de ew bi alîkariya du darên binçengan dimeşiya. Rûyekî wî yê nexuyayî ku hertim di nava herdu daran de veşartîbû, hebû. Herdu milên wî bilind bûbûn, sînga wî ketibû, lê çavên wî tije evîn bûn. Gava xwişka me ya biçûk agir dixist semawer û dengê qiçe qiça bizotên komirê hundur dadigirt, hingî kêfeke şîrîn xwe li rûyê bavê min datanî. Wî çayê kirdeme

vedixwar. Gava wî qurta xwe berdida ser gepa xwe ya hêla werimî, ger resimekî wî bihata kişandin, wî dikarîbû di pêşerojê de nîşanî neviyên xwe bida. Me jî ev dixwest.

Me dixwest zarokên me çêbibin, li bajêr bigerin. Ew çiqasî jî herin, ew dût narin. Mal ne ji hev dût in, xelkê me mîna diya me qelender e. Zarokên me jî wilo ne, tirsê me tune. Ma navê qeza û felaketê wê çi be? Lingê zarokê xwas e, wê mîx tê de herin, cam tê de here, hemû ev e. Elektirîk tune ku diya me ûtiya xwe li ser masê ji bîr bike û agir bi malê bikeve. Otomobîl jî ji hezarî yek di vir re diçin. Wê pê li kê bikin? Zarok hertim sax in, kuça me kuçe ye, bajarê me bajar e. . .Barê me biçûk bû, mîna gava roja pêşî ava bûbû, biçûk bû. Xaniyên ji heriyê pir bûn. Gava baran dibariya der û dor dibû derya heriyê. Di vê demsalê de bêhna Sergîn û heriyê ji ava bîra me dihat. Di havînan de jî, rojê wilo germ hebû ku em dişewitandin.

Roj belengaz dibû û ji van rîyan dernediket. Ev e, em li vê perçeerda pîrnîsî hatibûn dinyayê. Em li ser van erdan jîyan û mirin.

Berî ku em têkevin şerê azadiyê, hertişt mîna hînbûyinên kevin bûn. Em wilo bawer bûn ku, mamosteyên dibistanên me yên destpêk, kesin pir bîaqil î ji welatin din bûn. Hemû biyanî bûn.

Ew bi zîmanekî kî me tenê çend caran bihîstibû, dipeyivîn, lixwekirinên wan bi celebekî din bû. Wan rûyên xwe yên gewr bi kêle-

26

kên şefqan vedişartin. Te digot qey roj wan diguvêşe. Lê em peyayên rojê bûn. Me bi lingên xwe yên xwas bi solên wan yên spehî re qayîş dikişand.

Me qet nizanîbû bê ew konvoyên ji ocaxên madenan bi dev re tije bi ku de diçûn. Paşê di ser me re balafir difiriyan. Me bi şahiyek

bê tarîf bi bare-bar bang fikir. Me dixwest em bi wan re bifirin û herin. Gelo ji bo ku em têketina hembêza bajarvaniya ku ji pişt ewran dihat? Kî zane? Ma me dikarîbû sirra hêza ku em îdare fikir eşkere bikira? Me bi sedema serdestiya ku mirovên nazik û ji rojê ditirsiyan li ser me çêkiribû nizanîbû.

Lê mirovên ku ji rojê ditirsiyan bi sirrên îdarekirina mirovan dizanîbûn. Em herdu bira nikanin vê înkâr bikin. Li bajarê me cara pêşî wan sînema nîşanî me dan.

Me bi hev re ji ala û leşkeran re li çepikan xist. Seha topê çêbû. Malzeme peyda kir. Min di xeta berê de dileyist. Birayê min qeleparêz bû. Em sed metreyê direviyan. Wan bi hewa de demançe berdidan û ji bo qayişkişandina me saet digirtin. Di riya dirêj ya ku di nava xêzên kilsê de diçû û dihat sed metre azadî hebû. Heta tu bikaribî bazde. Wan ardê şîr, çend qutîk masiyên konserve û madalya didane me. Ew ji me bêtir di hundurê me de bûn. Wan ji baholên ku me bi pişt xwe hildigirtin, alavên ku me nasnedikir, derdixistin. Me bi diya min ya pîr stran da gotin û bi aletekî ji van dengê wê xistê. Bi yekî din jî nivîSeke li ser curn xist ser kaxezê. Yekî din ji meydana gund ya bêdeng wêneyên xaniyên me yên ji heriyê xêz kirin. Heta wan em pênc şeş kes anîne ba hev û resimê me jî kişandin. Yê ku wan bi destekî anîbûn, bi du destan birin. Dan, lê jê zêdetir birin.

Erda me jî berhemeke xwezayî ye ku mepirsin. Roj hene çav çavan nabîne. Tu dibêjî qey her tîrêja ku ji rojê diçe dişewitîne. Lê ne keskahiya daran ji keskahiya xwe tiştêkî winda dikin, ne jî berxwedana xaniyên me yên ji heriyê ji berxwedana xwe. Bîstanên me yên serbixwe li gorî bê ne. Her demsalê, ji her hêlê ve ji bereketa bê re filîz pêşkêş dibin. Mêwên wan bi rengên herî şîrîn ve dixemilin.

Roj û ava me di sindoqan de dibûn mêwe û ji welatên

27

kêmroj re dihatin şadin. Qehra toza bahozê ji me re, fêkiyê wê ji hinin din re. Me bi lingên xwe yên perçivî erda xwe ya sadîq diçût. Bîrên me yên petrolê makînen wan dadigirt.

Mirin ne tiştêkî hêsan e. Ger berê haya mirov jê hebûya, mirov ê ji cîran û dostan xatir bixwesta. Me ê bi rêk û pêk deynê xwe bidaya. Wê zîlamê wî du satil av bi dara wî ya hebûnê dake. Wê kayê bide kera wî. Ger bizanibe ew ê kengî bimire, berî du rojan ew ê gora xwe hilbijêre û bi xwe bikole. Ew ê li gora dilê xwe çayekê çêbike, piştî xwe bispêre dîwêr û bi kêf vexwe. Çaya dawî, xwarina dawî. Sibeha dawî. Qebileyeta mirovan ya ku qîmet bide her tiştên dawî, heye. Em mirov in, em xatirê nefesa dawî dizanin. Wextê me ji bo vê yekê çênebû; di ser re jî em pir zû mirin. Niha em rojan dixin ser hev û hesab dikin, em li ber dikevin. Diya me navê xwarina ku wê herî dawî ji me re çêkiribû dibêje. Birayê me yê biçûk qasmeyê ku ji mala cîranan bi emanetî anîbû, nebiriye nedaye wan. Wê hinek ji me deynê xwe yê dikanê bide. Karê me yê nîvcî maye heye. Ev mirin e. Gava mirin dikeve navê her tişt perçe dibe. Lingekî yê ku baz dide li hewa ye. Milê ku wê avê bide vexwarin, di dest de qedeh wilo maye. Nikane tevbilive ku. . . Em du bira ji vê rewşê bi gazin in. Xuyaye di mijara mirinê de em hatin lezê. Ji bo xwişka me jî zû bû. Em bi vê dizanin. Em li dijberî bûyerên ku qedera me reş kir ranewestiyên. Ocaxeke madenê li rex bajêr hebû. Karker ji me bûn. Roja herkesî di bin axê de derbas dibû. Heta tu bikaribî dakeve, dakeve. Her çar aliyên te zîndan e. Di nav re, ji bo dîtina der û dorê şewqeke qels pêdikeve. Piştî kar em ji bêhewatiyê gêj dibûn. Hewa jî heta tu bixwazî

germ bû. Minaqeşeyeke biçûk di navbera karkerekî û eskeran de derdikeve. Kêfa eskeran li cih e. Cigare ji nava tiliyên wan kêmbabe. Li jorî wan ventîlator dizîvirin. Divê ew bêdeng bin. Lê yekî ji wan ji diya karkêr re xeber daye. Çend heb ji karkiran tavilê li stûyê eskêr siwar bûne.

- Kuro, gotine, em her tiştên xwe didin we, qet nebe diya me ya pîrji merebihêlin.

Pîpîkên cenawir lêketine. Yê ku bi çîrokê nizanîbûn baz dabûn  
28

satilên avê, lê eskeran dest avêtibûn demançên xwe. Xwîna çar xortan rijandine. Wê şevê li bajêr çar jin jinebî, gelek zarok jî sêwîman. Humhumê dom kir. Sinir şidiyayî bûn. Yê me jî dotira rojê eskerek kuştin. Cihê kar bû mîna qesabxaneyekê. Yek li hemberî dehan, dudu li hemberî bîstan bû.

Di navê de çî bû, bi cîrn bû. Tanqek lê qelibî û perçe perçe kir. Me cehê hespên xwe pê neşikand. Genimê xwe nekir savar. Mirov bi rojan ji malên xwe derneketin. Di ser bexçê me re helîkopteran dest bi firê kirin. Zarokên biçûk nikarîbûn derketina hewşê û destava xwe bikirana. Dayikên me nikarîbûn kincên ziwabûyî bidana hev. Berê tivingan bi her tiştê ku tevdiliviya, vebû. Me di pencerên xwe re bi dizî li peyayên ku ser û rûyên wan bi mêşin pêçayî bûn û laşê wan yê li makînan hukum dikir, temaşe dikir. Roj wilo bihurîn.

Di dema herî bi qîmet ya ku bêzanîn ji temenê me dibuhurî, li erriya me xwêdan, di kulmên me yê guvaştî de jî hêrs hebû. Diya me li balafiran û li helîkopteran dinihêrî û hundurê xwe vala dikir:

- Min ji bo ku ew bikujin, neanîne dinyayê, digot. Hûn jî mîna

herkesî bijîn, temenê xwe bi bextiyarî bibuhurînin, bila zarokên we çêbibin. Wan ji bo pêşerojê perwerde bikin.

Ji çî be xwestekên pak di demên herî zehmet de têne bîra mirov.

Diya me ev gotinên han digotin, paşê jî serê xwe bi tulbendê girê dida. Me ew li ser dîwanê dirêj dikir û lihêfa wê pê dadikir. Di vê navê de xweha me ya biçûk, bi hîseke zarokan ji bo helîkopterê:

- Me ew tiştê ku difire dît, deriyekî wê yê mezin heye bi kêfdigot.

Zarok wilo bawer dikin ku di talûkeyan de ew bêpar in. Her tiştên ku ji mezinan tê dîsan ji bo mezinan e. Di eslê xwe de bobelat mirovan li gorî nasnava wan ji hev venaqetîne. Gava jiyan bi hemû zehmetiyên xwe ve bi ser mirovan de bikeve, tu mêr bî ji bin rabe.

»Min ew tiştê ku difiriya dît, deriyekî wê yê ecêb mezin hebû«, bi kêf bibêjin û me jî dixwest em bi xweha xwe ya biçûk re bike-

29

nin. Me dixwest em bi dengên bilind bikenin. Jiyanê paçikê tulbendê li serê diya me gerandiye, cara pêşî tekneyên ku li ezmên

mirinê dikişînin, nîşanî xweha me daye. Qederê zurafa ji baxçeyê heywanan dernexistiye û ji bo ku birayê me dîtina wê meraq dike,

neaniye gund. Zarokên dinyayê yê dilşa dikarin fîl û gergedanan ji nêzîk ve bibînin. Diya wan li baxçe şekir dide wan. Lê xwişka

me berevajiya wê, li bexçê mirinê pêşî gulên bitirs bêhn dike. Hewcedariya wê heye ku meraq bike.

- Ji bo çî ev dar evqas mezin e? Ev masiyên sor li nava avê çî digerin?

Ji bo çî ew ew nabêjin ku ew nikarin li rojê binihêrin? Nikare

bibêje, bi spehîbûna tekneya ku mirinê jê re tîne kêfxweş dibe:

- Min ew tiştê ku difire dît, deriyê wê yê mezin heye.

Zarokên dilşa her dem bi bebekên xwe yê ku dikene re dileyizin.

Birayê me qûmê naxe satilka xwe ya bi reng û nabe. Ew şewqê xwe yê kovboya î bi reng û ji kaxezan çêbûye naxe serê xwe. Ew li kuçê bi zarokan re baz nade û nalîze. Wê bi me re çavên wî li balafiran be. Wê bi tivingên bi makîne li dengê bombeyan guhdarî bike. Ew piştî me bû, lê wê bi me re bimire.

Her ku roj derbas bûn, bêhtengiyên mîna vê zêdetir bûn. Balafir pêşî yek bi yek bû, paşê gelek bû. Di destpêkê de gava ji saetê carekê yek dihat, niha ji deh deqîqan carekê yek tê. Dengê tanqan xaniyên me ji bin ve hejandin. Em hê bêtir zer bûn.

Mirina bavê me di van rojên nexweş de bû. Êvarek bû, em nuh ji kar vegeyabûn. Ez birayê biçûk, gava ez hatim ber derî, min darên bin çengên bavê xwe nedîtin. Min li êxur nihêrî. Hê ker nehatibû girêdan. Ceh û gîhaya wî ne hazir bû. Av neketiye hewdik.

Der û dor reşî ye. Ez dîsan vegeyiyam odê.

Diya min li ser dîwanê reng pê ve nemaye, radizê. Xwişka min ya biçûk li ber ocaxê rawestiyaye.

- Ew çûye ser erd.

Gava deqîqe derbas bûn û tu deng nehat, diya min dest bi girî kir. Em herdu bira ber bi roja ketî ve meşyan. Birayê min yê biçûk li şopên li erdê nihêrî.

30

- Ev ne şopa nalên kerê me ye, got.

- Ev ne serkulên kerê me ye, min got.

Tibabek mirov li ber qereqolê kom bûbûn. Herkes dipeyvî, kesî guhdarî nedikir. Hê em bi hev dişewirîn gelo em herin an nerin, ji milê me yê rastê dengê giryekî hat. Xaltiya Zohreyê li herdu çongên xwe dixist:

- Ewladê min yê çeleng, li ser erd helikî bû. Destên kirêt lawê



min kuştin.

- Rabe, yadê, here mala xwe, birayê min yê biçûk got, li vir zêde meqîre. Mirin li pêşiya hemû mirovan e. Em ê hemû bimirin.

- Mirov bi miriyan re namire, min got. Min dengê wê kiribû.  
Em meşyan.

- Dîsan ji taxa me kêr dibin, birayê min got.

- Xwedê bike hejmara wan ne gelek be, min got.

Bi rastî mirov çawan xemgîn nabe. Mirov ê çawan mîna Zohre xanimê li xwe nexe: Tiştê ku tu her roj dibînî, tu ê hew bibînî.

Êdî ew mirov tune! Ew dengê ku dibêje: «Rojbaş Mehmed efendî « êdî wenda ye. »Spas Mîrza beg, zarok çawan in, baş in?» tu ê nikarnibî bersivê bidî. Dîwarekî ku tu hîn bûyî her roj bibînî, quncikeke malê êdî xerabe ye. Çûk xwe lê danaynin. Birayê min napeyive. Em heta qereqolê meşyan. Gava xelk çav li me ketin, bêdengiyek çêbû. Herkesî bêdeng li me dinihêrî. Xuya bû ji me jî yek hatibû kuştin. Yê ji me kêr bavê me ye. Mîna ku bibêjin derbas bibin bavê xwe bibin, qerebalixê rê da me. Bê ku em ji kesî tiştêkî bipirsîn, em di riya ku vebûbû de meşyan. Deriyê qereqolê heta bi ser piştê vekirî bû. Mîna ku li bendî me bûn. Em bi endîşe ketin hundur. Di odeyeke biçûk de miriyên ku ser wan nixumandîbûn hebûn. Peyayên bi unîforma li wan deran digeriyan, li kaxezên spî hin nivîs dinivîsandin. Berî me yekî din tiliya xwe da ser kaxezê, miriyê xwe bir. Me jî defter îmze kir û miriyê xwe bir. Meytê bavê ye ev. Miriyekî ku pembo bi birînên wî yên sar ve zeliqî ye. Ne darên bin çengên wî xuya dikin, ne jî ker. Me bavê xwe li pišta xwe kir û berê xwe da malê. Wê diya me li xwe xe, em nizanin wê xweha me çi bike. Yê me jî taqeta peyvê di me de ne-

3i

maye.

Min ji birayê xwe pirsê bû:

- Ji bo çi kuştin ku? Ji bo çi? Wî çi kiriye ji wan?

Wî bi destê xwe yê bêmecal asmanê şîr nîşan da û nepeyivî.

Hilgirtina meytê bavê zehmet e. Ew destên ku bi dilnêrmî di dema zaroktiya me de em mist didan. Rûyê wî yê xemgîn ji jiyane xeyidî ye. Me ji bîr kiriye ku em çavên wî yên ku bi heyret li der û dorê temaşe dikin, bigirin.

Çena wî ya westiyayî daketiye, me ji bîr kiriye ku em girê bidin.

Ez, birayê mezin, min nikanîbû hêsiyên xwe bigirtana. Defterek tê girtin. Edî ji mala me yek kêr e. . .

Hêla mirinê ya herî bi êş jî ev e. Her tiştên di malê de tunebûna wî dide xuyakirin. Ji sifrê, ji rûniştinê, ji peyvê cihekî vala heye.

Gava yê mirî li jiyane bû, wî saeta li ser masê durust dikir, ew saeta han pir caran disekine. Divê yekî sax dîsan dest bi durustkirina saetê bike. Çûkên di qefesê de birçî ne. Divê êmê mirîşkên li hewşê bê dayîn. Diya me jî mîrxastir derket. Her dayik wilo ye. Gava hemû kar ket stûyê wê, ew bi ser xwe de hat. Hemû teşqeleyên berê neman. Edî ew şerkereke egîd bû. Ew bi sebir bû. Wê nan û xwarin şand mala yê mirî.

Ez bi serê yê mirî sond dbcwim ku heta diya min di nava alaviyê de neşewitî, ew qet hêrs nebû. Ew carekê tevliviya, lê mirin zû gihîştê ser. Mirinê ji diya me re wext nehişt. Jinik di nava wê telaşê de li zarokên xwe digere. Ew ê bi sînga xwe ya bi alav me hemêz bike, ew ê cara dawî me maçî bike. Ger rûyê me ji hev belav nebûbe bila ew di nava wan de bibîne. Milê min yê rastê li hewa difire. Kî dizane bê serê min li ku ye? Ma wê rebena jinikê kîjan perçeyên me bide hev. Ma qey wextê wê ji van tiştan re maye? Gava

alaviyê hemû lasê wê rapêça bû, gulleyên qedera wê di dilê wê yê pak de bi cih bûbûn. Em hê jî nizanin gelo diya me bi tesîra alaviyê miriye an na?

Ew bi xwe:

Ez bi gulleyan ji xwe çûm. Min wext nedît ku ez êşê bikişînim zarokên min, ew dibêje û me aş dike.

32

Lê tê bîra me ku xwişka me ya biçûk çawan şewitî. Ew ji rivînê mir. Ew niha jî înkâr nake.

Piştî mirina bavê me û heta ku diya me jî mir, her karê me kete rê. Em nikarin bibêjin ku rewşa me pir baş bû. Hemû hunera diya me bû. Ya rastî ev e, çima em ê înkâr bikin. Em ne bajarî ne ku em du odeyan bidin bi kirê û debara xwe bikin. Karê paqijiyê jî tune. Ne kanalîzasiyona bajêr heye, ne jî şiva tirênê heye ku em bekçîtîya wê bikin. Gelo em hêviya xwe bi zeviyên xwe ve girê bidin? Ev şer e, ger agirek pê keve û hemû bender li benderan bişewite û bibe xwelî. . .

Riya herî baş ew bû ku mirov daketa bîra madenê û vagon dagirtina. Me jî ev kir. Ji bo jiyanê ger wan ji diya me jî re çêr bikirana me deng nedikir. Hêza me ya sebrê, bû mîna dareke hêşin û baxçeyê me xemiland. Me bi qezenca xwe ya hindik, hewşek jî li dora xaniyê xwe lêkir. Me deriyê textînî li jiyanê vekir. Ger em nemirana, ez, birayê mezin li ber zewacê bûm. Gava zehmetî kêr dibin, di nava bêhtengiyên dawiyê de jî qeder firsenda evîndariyê dide mirov. Ger ruhê me mîna buxçukekê li ser hev kom bibe jî, dîsan evîn bi destên xwe yên pemboyî girêkên veşartî yên hundurê me vedike. Li vê dinyayê mirovê bêdil û taxa bê evîn çênabe. Ez, birayê mezin, min li taxa me ji keça Hiirmiiz Xanimê hez kiribû.

Me got em nîşanê çêbikin. Me soza xwe birî. Wê kêfa diya min were. Gava em ji kar vegerin em ê li ser nîşanê bipeyivin. Ez ê piştî xwarinê aşikê qehwê bigerînim. Em ê cezwe têxin manqilê. Wê diya min li fala me binêre û çi nebêje. Em zar û zêç hemû baş in, di hundurê malê de şênî û kêfxweşî heye. Şansê we vekirî be. Wê ax di destê me de bibe zêr. Em mîna rojê ne. Wê ji mista me huzûr birije.

- Bila birije yadê, min digot. Bila birije da rûyê me bikene.

Gava diya min fîncan didan hev, mijar ji destpêkê de digirt:

- Em di nîşanê de savarê bidin mêvanan, wê digot. Bila mêvan bi germî bixwin, bila zarok peran bidin hev.

- Em mitirban jî bînin, min digot. Min digot bila xelk kêf bikin, zar û zêç bilîzin.

33

Xwişka me ya biçûk jî:

- Bila kincên min jî ji yên bûkê be, digot.

Wê keçik qurdeleya sor bi porê xwe veke û hevalên xwe bidexisîne.

Ew ê benîştê xwe bike nepox û biteqîne.

Ez birayê biçûk jî, difikirîm ku ez xwe veşêrim û bi riya lîstikê keçikên taxê ji nêzîk de nas bikim. Wê rojek ji rojan dor bihata min jî. Divê ez ji niha ve karê xwe têxim rê.

Me vala xeyal çêkiribûn. Em li çi fikirîn, ew di qirika me de bû girêk û ma. Roja bêtam ya roja reş dîsan li wê xalê disekine, nameşe. Saetên me di wê saniyê de bêdeng man. Êdî wext ji bo me derbas nabe. Tu dibêjî qey rehetiya me bi saniyeyên dawî ve hatiye girêdan. Wê xortên me bi xortaniya xwe û kal û pîrên me jî bi kal û pîrîtiya xwe di vî zemanê teng de bimînin. Em ê neyên guhertin. Bi vî awayî yên ku dikenin -ger ew ji dînîtiya xwe bikenin- em

yên bi keder jî, me êş û ezabên xwe mîna ku ew dikenyan, vedişart. Piştî ku em mirin, me zarokên ku çavên wan ji kortikên xwe pengizîbûn, dîtîn. Di awirên wan de rivîn hebû. Ji ecêbmayînê devên wan ji hev mabûn. Hê jî ji destên wan yên vekirî libên savarê dirijiya erdê, ew nikarin bidin hev.

Gava keçên taxê, zar û zêç û pîrejî ketin hundur, reqisîn û kêf kirin, ez, birayê mezin li baxçe bûm. Xweha min bi kincên xwe yên nû ji ba wan nedilebitî. Birayê min yê biçûk jî nexuya bû. Kêfa me li cih bû. Kêfçiyar li der û dorê kêf direşandin. Jin direqisîn. Keçên ciwan di pencerê re, li min »zavayî« dinihêrîn. Ez jî li ber xwe diketin û min bi darikên kibrîtê li erdê xêz dikişandin. Wê piştî kurtedemekê diya min manqilê bîne ber min, ez ê jî ji bo mêvanan qehwê bidim ser. Zohre Xanimê fîncan şuştine, ew dibiriqin.

- Ji yên li hundur bipirse, min ji Zohre Xanimê re got, bila hejmara yên qehweya sade dixwazin belî bibe.

- Hemûyî normal çêbike, jinikê got. Xwe mewestîne.

Ez bi Zohre Xanimê re dipeyvîm. Bi carekê ve qiyametek rabû.

Mirîşkên li hewşê baskên xwe li hev xistin û ber bi rojê ve xwe

34

çem kirin. Çûkan çivên tirsê dane xwe û dûr firiyan. Birayê min jî ji tirsan digel nivînan ji kulînê hatiye xwarê, pasê ew bi bazdan hate ba min. Dengê qêrînên keçên ciwan hê jî tê bihîstin.

- Ger qiyamet rabûya wê ji vê çêtir bûya, min got, qet nebe wê ji kişandina kederê re wextê me nemaya.

Ger min bikarîba kêf û şahî û çûkên ku difirin bi destan bigirtana.

Ger min guleyên topan bihelandina, ger min barût birijanda

bîrên bêbinî da kes nikarîbûya daketa binê bîrê û ew derxista. Min

hesp birçî hiştine, ew nikarin siwarên xwe hilgirin. Demançeya yê

ku dibêje destê xwe bilind bikin, nateqe. Berevajiyê wê, gava ew pê li tetîkê dike, ji berdêla berikê, ava gula jê dirije. Ji berdêla bombeyan gurzên gulan ji balafiran têne xwarê.

Berevajiyê wê, qiyamet bûne berikê sîlehan û di ser me re derbas bûn, ew bûne bombe û li der û dora me ketin. Xuya bû ku wê xwîn biherikiya. Vê qerebalixa bêwext zora kêf û şahiya me bir. Hemû mêvan zipîzer bûbûn, zarokên biçûk digiryan û xwe li dayikên xwe dipêçan.

Dawiya deng û qerebalixê nedihat. Cemseyên leşkeran bi xurtî hatin û di ber mala me re derbas bûn. Ez û birayê xwe yê biçûk, em li baxçe difikirîn ku em ê çawan xelkê malê biparêzin. Çifteya bavê min di destê min de bû. Bivir jî di destê birayê min yê biçûk de bû. Me deriyê xwe jî kilît kiriye. Dengê topan, dengê tivingan, rev û bazdanê, balafir hemû hatin û xwe li çifteya ku bavê min ji min re diyarî hiştibû, girtin. Me komek zarok bi tivingê rêz kirine. Ew ê bivirê birayê min li hemberî guleyan derketa: **JI BO ZAROKA ŞÎRMÎJ, JI HER TIŞTÎ BÊHAY XWE LI DIYA XWE PÊÇAYE, JI BO JIYANÊ EW ÇIÇIKÊ DIYA XWE DIGUVEŞE.**

Bombeyê destan diteqin û pasê dengên nû têne bihîstin. Em nizanin bê çiqas wext di navberê re derbas bûbû, weha bi dilşewatî li deriyê me ket.

- Bi navê mirovatiyê derî vekin, birîndarê me heye.
- Zûka. . .
- Tişteki ku hûn bitirsin tune, zûka derî vekin.
- Ji bo însaniyetê derî vekin!

35

- Zarok û jin derbasî hundur bibin, min got. Heydê hemû winda bibin.

Gava kes li baxçe nema, me deriyê textînê hêdîka vekir; çavên me li sê peyayên ku çavên wan beloq bûne, ket. Yek ji wan baş nedimeşiya,

dikuliya. Yê din birîndarê giran bû, nikarîbû bimeşiya.

Yê sêyemîn zarokek bû, di destê wî de tivingeke bi qasî bejna wî hebû. »Hê jî hene bavo?« min got.

- Du heb li wê quncikê mirin, kalo got. Baş derî bigirin da em van birîndarên xwe derman bikin.

Lawik sîleha xwe danayne, li ber dikeve.

- Leşkeran dane dû me, em ji hev belav bûn.

Diya min û Zohre Xanim bi mereq dinihêrin. Yê din jî di pencerê re li me dinihêrîn.

- Heydê, hûn çî dinihêrin, min bi qêrîn got. Birîndaran bipêçin.

Ez bi paş de vegeyriyam:

- Ma we li erdê şopa xwînê hişt?

- Ma tu dikarî bipirsî? wan gotin.

Me birîndarên giran li baxçe dirêj kirin. Diya min mînderek li binê wî raxist û behlîfek jî xist bin serî.

Zohre Xanim bişkokên gomlekê bi xwîn yê birîndêr vekirin:

- Gule di hundur de belav bûye, wê got.

Yê birîndar bêhay:

- Ehmedê min, Ehmedê min, ew bi nalîn dibêje.

Hevalê wî:

- Navê lawê wî Ehmed e, got. Tê ber çavê wî. Xuya ye ew ê bimire.

Diya min av berda devê yê birîndar. Wî li xaleke sabit nihêrî û keniya.

Yê xort xwe spartiyê sîleha xwe:

- Tê ber çavê min. Ew niha ne li van deran e, ew niha li mala

xwe ye, got û bêdeng ma.

Pir tê re neçû, yê birîndar zêde debar nekir, ew mir. Dawiya bişîrînên nexuyayî hat.

36

Diya min rahişt sîleha yê mirî. Zohre Xanim jî şeltekî spî bi ser da kir. Birîna birîndarê din jî hate pêçan. Xwarina wî danê. Piştî ku wan qehweya xwe jî vexwarin ew bi ser xwe ve hatin. Yê ciwan li nav baxçe digere. Ew pelên dara mişmişê jê dike. Yê kal jî behsa sebzeyên ku wê li baxçe bihatina çandin dikir. Ji bo ku em erdê bi qewet bikin, nizanim em ê çi tevî gubreyê bikin? Divê tovê kundur rojekê di avê de bimîne.

Gava Zohre Xanim savara nîşanê û seriyên penîr danî ber wan, mijar hate guhertin:

- Li vî qismetî binêrin, gotin û kenyan. Em ji meydana şer hatine mala dawetê.

- Hey gidî dinyayê, yê din got. (Savar xiste mista xwe.) Wan em rehet bihiştana, em ê îşev bi dilê xwe razana.

- Ma tişteki payinê ye?

- Nayê zanîn.

Di navberê de demeke din jî derbas bû. Gava dengê top û tivingan rawestiya, vê carê cemseyên leşkeran ketin kuçê. Cemseyên leşkeran li ser kuçeyan rawestiyan. Dengê lîngan ji ber deriyê me dihatebihîstin...

Ez û birayê xwe yê biçûk ji ser xênî daketin. Leşker di quncikan de ketin mewziyan. Berê lûleyên sîlahên wan li kuçeyê dinihêrîn. Ew cemse her dem amadebûn ku biteqînin. Piyade li erdê li şopê digerin. Hinekan ji wan li miriyan dinihêrin. Ew diketin malan û derdiketin.



Kalo li diya min zîvirî:

- Dayê, tu têkeve hundur, bila kes li baxçe nemîne.

Gava li deriyê me ket, du welathezan xwe çem kirin sîlahên xwe.

- Wilo nekin ha! min got. Ma hûn ê evqas zarok tune bikin?

Hêdîka:

- Em çi bikin yaho, gotin. Em çi bikin?

- Xwe di êxur de veşêrin. Yê mirî jî bi xwe re bibin.

Ez çûm ba diya xwe:

- Bila hunermend lêxin. Bila her kes kêfa xwe ya berê bikin,  
37

min got. Zarokên ku digiriyan bi şîmaqan hatin bêdengkirin.

Herkesî hêdî li çepikan xistin. Ji aliyekî ve jî li derî ket:

- Derî vekin, derî vekin!. . .

Birayê min yê biçûk jî du satil av li lekeyên xwînê kirin. Welathezan xwe di êxur de, di nava kayê de veşartine. Me hêdîka deriyê xwe vekir. Sûbayek û çend leşker bi xurtî ketin hundur. Diya min û Zohre xanim lîstik di nêvî de hiştin. Piştî kêliyê deng ji muzîkê jî hate birîn.

- We anarşîst lu ku veşartine?

Niyeta wan tune ku ew cihê wan bibêjin, li hundur bigerin!

Ma em ê wan li ku veşêrin, teymenê min, min got.

Em wext winda nekin, hê malên ku divê em lê bigerin hene, teymen got.

Leşker bi sîlehên xwe ketin hundurê odeyan. Zarokên biçûk ji tirs dest bi girî kirin, keçên ciwan jî ji şerman rûyê wan sor bûn û serên xwe berdan ber xwe. Dergîstiya min jî digiriya û destmala di destê xwe de dicût. Wan li bîrê nihêrîn, paşê jî li êxur geriyan.

Wan der û dor didan ber dîpçikan. Her tişt derket ortê. çavên wan li kaloyê ku ka ji ber xwe dida alî û yê mirî ketin. Welathez di bin kayê de bûn. Herdu jî difikirîn.

Teymen çêrên dinyayekê ji jin û mêr û zarokan re dida. Gava wî bi demançeya xwe yên hêsîr ber bi hewşê ve dehfda:

- Berî bi saetekê, li ser girik hûn ne wilo bûn, got. Niha ferqa we ji pisîka ku şîr rijandibe, tune ye.

Welathezan bersiv nedan. Yê xort, bi awirên çêrtijî li leşkerê ku sîleha wî jê stendibû, nihêrî. Heçî yê kal bû, ew mîna heykelekî bêtevger bû. Wan sîleha wî û çifetaya me ji destê wî derxistin. Paşê jî du kulmên baş lê xistin.

Teymen:

- Mêrkujên pîs, hûn ê niha hesabê kirinên xwe li hemberî xelkê bidin, got.

Xwîn ji lingên kalo diherikî.

- Em ji mirinê natirsin, wî bi xayizbûn got. Ev e, me bikujin.

3»

Leşker li kêleka hev ketin rêzê. Welathezê ciwan berê xwe bi me vekir:

- Mirina di ber welêt û di ber azadiyê de bi rûmet e. Qeder me zû ji vê dinyayê vediqetîne, got. Gava ew dipeyvî zimanê wî li hev digeriya. Lê van bêrûmet û rezîlan ji bîr mekin. Wê roj were, ev erd ji wan re jî bibe gorr.

Teymen:

- Hiş be, kuro, bi qêrîn got. Raweste, ez ê kêliyek din wî zimanê te bibirim.

Paşê jî ew li me zîvirî:

- Zilamê malê kî ji we ye, got. Ew mazûbanê mêvanhez kî be,

bila derkeve meydanê.

- Ez im, min got.

- Ma tu bi cezayê veşartina anarşîstan nizanî?

- Em dizanin, lê, gelo sûc di dermankirina birînên birîndaran de ye? min got.

Ew li leşkeran zîvirî:

- Vî bigirin, ew tewş dipeyive, got. Te çima yê mirî bi yê birîndar re veşart, ha?

Min bersiv neda.

Gava du leşkeran bi milên min girtin û ez ber bi hewşê ve kişîşandim, dengê feryadan ji dû min hate bihîstin. Ew dengê diya min bû. Mirina ewladan zehmet bû. Ma dilê kîjan dayikê xwe li ber vê yekê digire ku dilê diya min xwe li ber bigire. Ez bi rewşa dergîştîya xwe nizamim. Birayê min yê biçûk, ji ber giriyê diya min û ji ber ajotina min ya ser mirinê xwe negirtiye. Ez di nava destên du leşkeran de bûm. Yên din jî welathez didan ber kulm û pehînan. Ji pişt min dengê hat, xwe avêtin ser Teymen, ez li pişt xwe zîvirîm, min dît ku Teymen li erdê digevize. Belkî jî ew ê bimire. Dema çeya wî ber bi hewşê ve teqiya.

Du welathezên ku ji şaşbûna leşkeran destkewtî bûn, xwe dane pêş. Min jî xwe avêt ser dema çeya Teymen ya li erdê. Hay û hûyek bi hewşê ket. Zar û zêç reviyên hunduran û welathezan jî dest avêtin sîlahên xwe yê li hewşê. Min bera leşkerekî bi sîleh da û

39  
ew ket erdê. Welathezan jî herduwên din kuştin. Dawiya maye jî di deriyê vekirî re baz dan. Ev hemû di demeke pir kurt de bûn. Me leşkerên mirî kişandin ber derî û kinc û sîlehên wan ji wan kirin. Gelek gulle bi wan re hebû.

Gava welathezê ciwan gulle xist sîlehê, tif kir rûyê Teymenê mirî:  
- Bêrûmet, got, tu bi lingên xwe hatî ser mirinê. Te ê ez bikuştima,  
lê tu bi xwe hatî kuştin.

Ji vir û pê ve çîroka me nayê bîra me. Her kes cihê behs dikin.  
Ne xuyaye bê kî ji me berê mirî ye. Gotin hevdu nagirin. Gava ez  
ji diya xwe dipirsim, ew bersiv nade.

Tu ê çi bikî jê, kurê min, diya min dibêje. Tiştê em dizanin,  
em hemû mirine. Çawa, çilo? Çi fêda wê heye ku em niha vê çareser  
bikin?

Gelo bûyer rast bûn, ne rast bûn, rivînê ji ku dest pê kir, bombe  
çawan teqiyân; ez li ser kîjan perçeyî belav bûm, diya me û xwişka  
me çawan bi saxî di nava êgir de şewitîn, û gelo me qêrînên zarokên  
biçûk ku ji ber dest û lingên xwe yên jêkirî digiriyan, bihîstin?

Em nizanin. Diya me rast dibêje. Xuyaye li baxçeyê me, xwişk û  
bira, dê û cîran em perçe perçe bûne û belav bûne. Ma wê çi têkeve  
destên me ku em li awayê kuştina xwe bikolin?

Niha kêleke gorra me jî tune ye. Û li milê me yê çepê jî mala me  
ya wêranbûyî heye. Kund hêlînên xwe li ser çêdikin. Serfiraziya  
mirovên ku ji rojê ditirsin bûne strî û li baxçeyê me geş bûye. Li  
cihê sebze gêrik hêlînan çêdikin. Kesî me tune ye ku dîwarên me  
yên wêran ji nû ve lêbikin û der û dorê dîsan hêşîn bikin. Em li  
mirovên ku dikarin ji bîra me avê bikişînin û der û dorê paqij bikin,  
digerin. Em dbcwazin warê me dîsan şên bibe. Em dixwazin  
tîrên ku hevîrê peqlewê vedike û destên ku wan dizîvirînin bi paş  
de vegerin.

Em dixwazin, muzîka me ji cihê ku hatibû birrîn, dest pê bibe û  
em dîsan dest bi kêfa xwe bikin. Dergîstiya min hê govend negirtiye.  
Ew ne westiyayî ye. Min pere bi eniya dergîstiya xwe ve nekiriye.

Eniya dergîstiya min li navê nexuyaye! Em dbcwazin zarokên

40

mirî kulmên xwe yên ku savara germ jê dirije, bigirin. Lîstik û şahî heqê wan e. Bila xwişka me jî bi kirasê xwe yê nû dilşa bibe.

Qurdeleya wê ya sor çiqasî li porê wê tê, ew ê li neynikê binihêre.

Neynik şikestiya, rûyê wê dibe hezar perçe!

Em ê nikaribin kesî di hundurê vê xemgîniyê de dilşa bikin.

Her gava em ji bo xweşbîniyê davêjin, vala ye. Em dbcwazin yek derkeve û destê xwe bibe ber lêvên xwe;

- Hişin, bibêje ji tanqan re, ji topan re bibêje, hişin. Bila ji berdêla şer, kêf û şahî hebe. Rehetiya zarokan xera mekin, hişin, hişin!

Berevajiyê wê tanq di ser me re derbas dibin. Niha jî, gava em

dengekî biçûk dibihîzin, tirska ku em ê careke din bimirin peyda

dibe. Em ji bo kesên bêkes yên ku li taxa me mirine, gilîdar in, em

ji bo malbata xwe ya ku qir bûye gilîdar in, em daxwaznameya

xwe pêşkêşî mirovahiyê dikin. Tilîka xwe deyne ser xwakê, yadê,

cîranino. Tu jî bavo. Bila hemû dinya bbcwînin, bi rewşa me bihesin.

Werger: Firat Ceweri

4i

Mirina Mirişka Spî

Jiyana li biyanîstanê, mirov dike dîlê hênetiyên cuda. Bi xwestina,

ji bo ku tiştêkî ji bîr bikin, hûn bi dû mijûliyê de diçin,

weke keştiyêke ku li ser avê diherike. Hîseke neserketinê ku hûn

sedema wê nizanin an xemgîniyên ku şasiyek afirandine, we dike

nava lepê xwe. Hûn xelasiyê bi yekbûna xwezayê re dibînin. Ji

xwe li welatekî biyanî, ji malbata we pê ve kesekî din, ku hûn bikaribin

pê re deng bikin li hawirdora we tune be, an go kesek qîmetekê

nede we, ango we nas neke wê gavê rewşa we xirab e, wê

demê ji bo we xweza maneyeke gelek cuda dide û cihekî giran digire. Tu dibêjî qey zaroktî, jiyana xwendegehê, a leşkerî û pêdaketinên we yê hunermendî, li paş dîwarên qalind dimînin û weke ku ev macerayên yekî din bin, biyanî dibin.

Bîreweriyên kevn ku we bextiyar dikin mîna çûçikên kewçirkan belav dibin. Çi bîreweriyên we.yên dijwar; nexweş hebin, ew jî bi poşmanî û neserketinên we re yek dibin û bi hev re derdikevin pêşberî we. Hûn dibêjin qey êdî dibin mîna mirovekî ku li serê çiyar û li nav daristanan tobe dike.

Gundê ku em lê dijiyan li xewlecihekî bû, mehên havînê hênik dibuhurîn, heftaya pêşîn a meha çiriya paşîn hawirdora me bi berfê tijî dibû. Ev berfa ku şeş mehan ji cihê xwe qet ne diliviya û ne jî dihelîya, bi berfa ku nuh dibariya re girên mezin ji hev diafirandin.

Ji bo ku hawirdora mala ku em lê dijiyan vebikim, min her sibe du saetan berf davêt. Dema bi qasî ku mirov bikaribe tê de bimeşe min rê vedikir, ez gelekî kêfxwef dibûm. Lê ber bi nîvro ve dîsan berf û bahozê dest pê dikir. Hemû xebata min bertelef diçû. Mala me li nava daristên bû. Spîndarên dirêj ku ser şaxên wan tijî berf dibûn, nûneriya dinyayeke bêdeng, ku ji taritîyê zû nependî

42

dibû, dikir. Dema ku tarîtiyan hêj nava rojê bi ser we de digirt, we ê bigota «roj qediya» û we yê fikira roja dahatû bikira.

Mala me li kêleka daristanê bû. Xezal û pezkûviyên ku tevaya zivistanê zehmetî dikişandin da ku tiştêkî xwarinê peyda bikin, bi keriyên dadiketî baxçeyê me. Heger me tîfinga xwe ber bi wan ve bikira, wê gavê, bi derbekê re me ê dudu ji wan bigevizanda, biguranda û di sarinca xwe de bi cîh bikira. Lê me bela xwe qet li van heywanan nedida; giyayê ku mehên havînê me dabû serhev û

hişk kiribû me ew didan wan, dema ku dixwarin min li wan temaşe dikir. Min bi wan re dostaniyeke ku berf û sermayê pêskêşî min kiribû, danîbû. Dema ku berfdiheliya û dinya dibû bihar, wê gavê jî ev dostaniya me diqediya. Edî pezkûvî û xezalên min dikişyan ber qiraxa gola paqij ku li wê derê çîke-çîka çûkan bû, wan jî li wir baz didan, direviyan. Bo ku em jî tama biharê derînin me li ser çiya û girikan baz didan. Kerguhên berrî li derûdora me diçûn û dihatin, soriyan xozên çeman dikeritandin, ordek û qazên bejî di ser serên me re difiriyan. Mîna hemû gundiyan me jî, ji bo teyr û çûkên macir hêlînên ji text amade kiribûn. Me ev di ser darên nav daristên de bi cîh kiribûn. Gelo ew kirêdarê ku em li hêviyê bûn, hat wê mala çûkan?

Me kontrol dikir ku em bibînin, da çûka mê li ser hêkên xwe raketiye. Di wexeteke kurt de ev hêlîn tijî dibûn. Ev çûkên ku ber bi zivistanê ve dê di ser îtaliyayê re, bifiriyana Afrîkayê renga -reng û celeb celebî bûn, periyên wan zer, hêşîn, sor û mîna çûka malê gir bûn. Rojekê, li hêlîna çûkekî ku nêzîkî mala me bû bûyerek ku kesekî nedipa qewimî. Pisîkeke bejî dilê xwe li wê hêlînê xera kiribû. Pisîka bejî çend carî hewl dida ku çûk û çûçikên di vê hêlînê de bbcwe. Çend çaran min kevir avêtibûyê, min xwestibû ez wê bitirsînim. Lê wê guh nedayê û tenê xwe ji ber kevirên min dida alî. Wexta ku min dixwest wê bitirsînim, ez bi ser de diçûm, wê laşê xwe dirêj dikir, vediziland û dixwest min bitirsîne. Lê li ba min jî mirîşka min a spî ku qet ji min nediqetiya, biçûma ku bi min re bû, hebû. Bi wê re min gelekî hevaltîyeke xwey danî bû. Dema ez di kilûba xwe de ku li tenişt mala me bû, li ser daktîloya

43

xwe rûdiniştim û min dinivîsand, ew di deriyê vekirî re dihat li ba

min radiwestiya. Dema min nivîsên xwe, ji bo ku rêbikim dibirin, davêtin qutiya postê, ew jî digel min dihat. Em digel hevûdu, li ser hêlînên çûkan digeriyan. Heywan li mirovên ku tevaya rojê bi tena serê xwe kar dikin re nêzîkayê raber didin. Niha, bûyera ku ez ê li vir behs bikim, di navbera wê mirîşkê û pisîka bejî de derbas bûbû.

Rojekê, ez li malê rûniştibûm, li derve min hengameyek bihîst. Pê re jî bi lez û bez derketim der. Pisîka bejî bi darê vc hilkişiyabû, hêlîna çûkan xistibû erdê û hewl dida ku çûçikan bixwe. Mîrîşka min a spî ji bo ku van çûçikên çûkan xelas bike êrîş biribû ser pisîka bejî. Mirîşk û pisîk serûbinî hevûdu dibûn û şerekî bêhawe di navbera wan de dest pê kiribû. Ji ber çavên pisîkê xwîn diherikî û bi boça mîrîşkê ve jî perî nema bûn. Min kevir avêtin pisîkê û bi zor ew ji wir qewirand. Min rahişt hêlînê û lê nihêrî, du çûçik winda bûn. Heta ku mirîşka spî pê ve gihîştibû. Pisîkê dudu ji çûçikan xwaribûn. Lê qet nebe sisê ji wan rizgar kiribûn. Bo mirîşka spî ev jî serketinek bû. Belê, ev bûyera bû ku weke bîreweriyeke biharê di mêjiyê min de mabû.

Hezkirina min a mirîşka spî zêde bûbû, min dostaniya xwe pê re xurttir kiribû. Min giyayê hêşîn jê dikir û bo wê pêşkêş dikir. Kêfa wê pir ji mewîjan re dihat. Dostaniya me tevaya havînê domand. Min mesele ji keça xwe Sibelê re vekir. Xweşdosteke heywanan bû. Li navçeyê beşdarî musabeqeya xweşikbûna keroşkan bûbû, bi keroşkên ku mezin kiribûn re, hercar yekemîn derdiket. Ew digel hevala xwe ya xwendegehê Tonê, beşdarî wan musabeqeyan dibûn. Tonê alîkariya wê dikir. Xelatên ku qezenc dikirin mîna bira li hev parve dikirin.



Çewlik nêzîkî gundê ku em lê diman, li ser çiyayê Hoftûnê bû.  
Li çewlikê xaltiya Tonê dima. Ji bo ku em mirîşka Spî lê bihêlin ji  
vir cihekî baştirîn dê neba. Sibel û Tonê mirîşka spî xistin hundirê  
qutîyeke ji qertonê û hêdî -hêdî bi çiyê ve ber bi çewlikê ve hilkişyan.

44

Rêwitiya wan du saetan domandiye. Dema ku gihîştine Çewlikê,  
xaltiya Tonê gelekî baş bergiriya wan kiriye. Keça min jî keniyaye  
û gotiye: »Me dostek ku bavê min gelekî jê hez dike, ji te re  
aniye«, û qutî vekirine - Lê çi bibînin!?

Mirîşka spî ji bêhewabûnê fetisîye.

Zarokan bi bazdanê xwe ji çiyê berdan xwarê û hatin. Herdu jî digiriyan,  
mîna ku me hemiyan mirovekî xwe winda kiribe, em jî  
wisan xemgîn bûn.

45

Cîhana ku li qederê vedigere

Li ber deriyê mazata Delalan otomobîl mirovan dieciqînin; yên  
nûzewijî ji dikanan firaxan dikirin. Bayê germ, kaxezên zeytûn  
û helawê yên ku karkeran û barkêşan avêtine, li ba dike. Erebeya  
dutekerî ku du ga bi zorê dikişîne, trafikê tevlihev dike; li pişt erebeya  
ga jî, kamyonên bi bar û kamyonên textan rêz dibin. Dengê  
çêrên şofêr û xwediyên erebeyan têne bihîstin. Zadçineke mezin,  
li têtên telefonê yên li ber mazatê dialiqe. Gava ew berepaş ber bi  
mazatê ve diajo, kincfiroşên kincên kevin "tu ketî ocaxa me" bi tinaz  
dibêjin.

Lê belê ew ê ber bi zewiyên germ, ber bi zewiyên bi bereket ve  
here. Qismetê gundiyan genim e. Ger pere nekeve destên gundiyan,  
kî ê li vî bajarî çi qezenc bike? Kes li vê nafikire. Gava zadçin  
dikeve rê, kincfiroş, "Bankeya Zîraetê diçe" dibêjin û dikenin.

Peyayê herî bi hêz yê mazata Delalan, Osman bû. Hebûna wî dîwarê du metreyî ku wî çakêtê xwe pê ve bi dar de dikir, deyndarê wî bû. Ji ber ku li vir qet karê tapoyê nemeşiyaye. Ma milkê dîwêr jî çêdibe? Ev di qanûnan de tune. Cihê ku qanûn lê bêdeng be, hêz û qurnazî dipeyive. Loma her tim cih diketin destên mirovên cûda. Osman bi tesbîha xwe ya kehrîbanî û bi simbêlê xwe yê boq di wir re derdikeve. Ji kul û xeman dûr, ew cihê xwe dibîne. Ew bi rewşê dizane:

- Ma bûyerek bûye?

Yekî ku bi paqijkirina kincên xwe yê ku spartine dîwêr ve mijûl e, "ne weke do" dibêje. "Ma heya em dev û pozên hevdu neşikînin ev kar nameşe?" Osman dibêje. Ew ji dubarekirina vê gotinê zewqeke mezin distîne.

- Êêê dostino, ma mirîdên nû yê ku ketine tekeya me tune?

46

Ji roja ku Osman bûye berpirsiyarê mazatê û bi vir de, ew kadroyan di ber çav re derbas dike. Heta ku erebeyên hespan dihatin û xwe dispartin deriyê mazatê, ew teftîşa Osmên dom dikir. Gava hespan ew der dilewitandin Osman, "ji belediyê re kar nemaye" digot û ji nişkê ve li du peyayên reben û stûxwar ku li ber wî rawestiyabûn,

hayî dibû. Ma wan herdu peyayên ecemî dikarîbûn bêî destûra Osmên kincan bifiroşin?

- Em in axa, wan bi stûxwarî digotin, me ji taxê ev kevnekincên ha bi erzanî bi dest xistin. Em ê wan li vê derê bifiroşin.

- Ma hûn ji vî karî fêhm dikin?

- Ne ewqas, em ne bi qasî we hoste ne.

Şîrîkê wî tevî peyvê dibe:

- Em têkilî kesî nebin, Memet got, em çar salan di girtîgehê de li ba hev man. Tenê tiştên ku me xwarin û vexwarin cihê çûn. Me bi hev re biryar dida.

Yê din dom dikir:

- Kuro Ahmet, min got, ma herkes çawan qezenc dike? Ma bayê sor bi me ketiye? Çiyê me kêmi xelkê ye? Ger em ketibin girtîgehê em nemirine ku? Wek yê xelkê zimanê me jî heye. Em ê jî mîna herkesî bi keda xwe qezenc bikin. Me pasê destên xwe dane hev. Min ji morîkan cûzdan çêdikir, min bazinên jinan çêdikir, Ahmet jî mar çêdikir. "Gardiyan jî peyayekî baş bû haa. Xwedê jê razî be, wî jî pere dida me." Ahmet, "erê" digot û paşê li rûyê Osmên dinihêrî.

- Baş e, lê gardiyanê vir jî heye. Karê wilo vala nabe.

- Em dizanin axa, digotin. Wan yek ji kincfiroşan nîşan didan:

- Me Receb dît, haya me ji rewşa mazatê heye. Tu meraqan meke axa, em çî bifiroşin, em ê para te jî bidin te.

Osman ji kincfiroşên nû re salepê dixwaze, lê ew naxwazin vexwin.

Ev îkrama ku li vî cihê biçûk ku menfeeta wan tê de heye, hîsên wan yên pak tîne zimên:

- Em sibehan vî karî nakin, em ê piştî nîvroyan bikin. Guh mediyê axa, ji bo me mesrefê meke. Ji xwe ji nîvrojê re zêde nemaye, wan digotin.

47

Ji erebeyên hespan kursiyên kevin û sobe tîne daxistin. Barkêşên mazatê bi bêhnçikandin wan dadbcin mazatê. Gava Osman cigareke nû pêxist, bi esnafekî li ser lingan re dikeve sohbetê. Wî bi vê yekê qeder û dergehê qismet bi hewayeke nependî dinixumand. Wê demsalê esnaf û kincfiroşên nû pir bûbûn. Li dîwaran cih

nemabû ku kincfiroşan kincên xwe pê ve bi dar de bikirina. Hinek kincfiroşan kincên xwe li pişta xwe dikirin û ew li mazatê digerlandin. Mîna berê, îlankeran jî nikarîbûn li jorî deriyê mezin yê textînî afîşên derman û sabûnan bizeliqandina. Osman çû ser milên du peyan û bi misasekê kincên xwe bi mîxên bi dîwêr ve kutayî ve bi dar de kirin. Digel ku şer û pevçûn kêr nedibû jî, dîsan herkes ji jiyana xwe dilşa bûn. Wê salê çend quruş ketin destên esnêf. Kevnedîwaran li gotûbêjên xweş yê kevnekinan guhdarî kirin. Ger şahî û huzûr qezenckirina peran bûya, cîhana biçûk ya li pişt vî derî, ber bi wê ve dizîvirî.

Osman di birêvebirina mazata Delalan de, zehmetî nedikişand. Wan jî yeka Osmên nekirin dudu. Belediye li hemberî wan bûbû yek. Yê ku dihatin malê xwe bifiroşin, di ser buhayê ku Osman digot re, nedifirotin. Dawî dawî dîsan mal kete destên wan. Yê ku qezenc kirin, qezenc kirin.

Hemû rojê pareke biçûk jî digihîşte kesên ku karê esnafan hêsan dikirin. Osman "kî ji kê re delaltiyê bike, bila mafê xwe bistîne. Yê ku mafê xwe bestîne jî bila werin ba min" digot. Du çêr têra qedandina kar dikir.

Navbervanî jî bi rastî hunerek bû. Bi gundiyan re muameleyeke cihê dihate kirin, ji yekî nû re muamleyeke cihê dihate kirin. Yek dibêje: "Hemşerî, tu ji kîjan gundî yî?

- Ez ji Umaratan im, ji gundê pişt çiyê.

Ew ji lixwekirina kincan dilşa ye, gava yê gundî li dayîna peran difikire: "Kîjan îrîza" dibêje. Ma gundên bê îrîza hene? Navbervan "îrîzaya mezin" digot, îrîzaya xwesiwa muxtêr".

Yê navbervan dom dikir:

- Nebêje ku tu ji me yî. Bila ev peya zêde ji te nestîne. Ma wî ji

te re got sed û sî. Pênc lîra îkram bike. Xatirê vî peyayî li vê mazatê heye. Heydê, tu xêrekê jê bibînî." Gava yê gundî diçû, "silavan li îrîzayê bike" yê navbervan digot.

Gava kar wilo dimeşîya, serê Osmên tevlihev dibû. Li dû hev pêçana wî ya cigarê, zêde çêkirina wî fikir ku yê din bawer bikin ku karê wî baş naçe. Hinekan li ser hev pere dihejmartin destê wî. Wî pere ji bêrîkeke xwe dikire yeke din. Wî paşê dîsan derdixist û dixist cûzdanê xwe. Yekî din, buhayê kincên ku nû kirî ye di serê xwe de çêdikir. Yekî din, bişkokek çakêtekî kevin lê dixist. Yekî din dixwest şûna stêrka li milê çakêtekî resmî jêbibe. Gava Osman simbêlê xwe yê ku ji dixana cigarê zer bûbû, ba dida, bi hêrs digot:

- Kuro ez çî dibêjim ew cidî nagirin. Min mîna kûçikan nedin reyandin. Werin vir!

Hinek,

- Ma te ji me re got axa, dibêjin û ber bi pêş de tîn.

- Bang hemûyan bikin bila werin vir.

Rewşa Osman tavalê xuya bû. Hukmê wî yê bi biryar tavalê hakimiyeta wê belawelabûnê kir. Yekî ji nav wan:

- Werin zaron, civîn heye, got.

Yekî din jî,

- Kuro ma wê vê yeksemê dîsan Osman axa me bibe kongreya partiyê? got.

Osman bi çavan her kes dawerivand û dengê xwe hê bilindtir kir û peyivî:

- Kar baş diçe, esnaf zêde bûne. Ev cihê mîna hêlîneke çûkan ne qîşleyek e ku me tîn bike. Ez destê xwe bilind bikim wê li esnafekî

bikeve. Ewqas pir hatine vir ku em nikarin ji wan tevbilivin.

Ji niha û pê ve li vê mazatê ji pênc kesan re cih tune.

Çend kesan gotin:

- Wilo nabe, axa, zar û zêçên me hene, ma ev çî gotin e.

Osman ji wan te got:

- Xatirê me li qereqolê heye.

- Em dizanin Osman axa, gotin, xatirê te heye.

49

- Hukûmet ji bo bekçîtiya mehelê li peyan digere. Wê sê kes bikaribe vî karî bigire.

Kesî guh nedan wan du-sê gundiyên ku li ber deriyê mazatê diçûn û dihatin. Herkesî guhdarî dikir.

- Dawiya maye jî wê di dibistana destpêkê de bibe paqijker. Kes birçî namîne.

Osman peyva xwe xelas kir. Hilmek li cigara xwe xist. Ew dîsan fikirî. Ew bi simbêlê xwe yê boq mîna qatek kincên ku tu bi dîwêr ve bi dar de bikî xuya dikir, lê ew di kûraniya fikran de winda bûbû. Esnafan li ber derî dest bi mînaqêşê kiribûn. Wan bi girîngiya biryareke wilo dizanîbûn. "Pir zehmet e ku em Osmên vegeînin." Yekî, "Osman berê ne wilo bû, çî pê hatiye" got. Osman tenê li peran difikire. Em hemû li dîwêr pera ne. Ma ne ji bo peran be, çî karê me li vir heye? Yekî din, "Ka ez bi Osman re bipeyivim, heta ez bangî we nekim hûn neyên" got. Ew çû ba Osmên û ew ji fikrên wî bi dîwêr xist.

"Ev bêhtengiya te ji çî ye Osman axa, ka ji min re bibêje. Em dizanin ku tu çav bernadî qismetê pênc kesan. Tu peyayekî çavtêr î. Qenciya te digihîje me hemûyan. Em biçin kîjan qehwê, dibêjin ev peyayên Osmên in û bi xêra te hurmetê nîşan me didin. Ma tu

pênc kesan ji me ji kar bi dûr bbcî wê çi têkeve destê te? Dev ji vê yekê berde, bila herkes nanê xwe bixwe. Me çi ji bekçîtiya taxê ye, me çi ji paqijkeriya dibistanê ye. Bala me kesî ne li ser van karan e. Tu me hewcedarî dergehê dewletê meke!

- Tu diçî kîjan qehweyan Durmuş? Osman pirsî.

- Ez diçim qehweya bi birk, ez diçim qehweya mahciran, ez carinan jî diçim qehweya kerxanê.

- Li her derê min nas dikin, ne wilo Durmuş?

- Erê, ew te nas dikin, ew dibêjin ev peyayên Osman axa ne û ji me re hurmetê dikin.

Osman dîsan fikirî:

- Durmuş, got, em ê sibehê vir têxin pergalekê. Divê sibehê her der bibe mîna gulan. Wê li vê derê paytonek raweste. (Bi destan 50

deriyê mazatê nîşan da):

- Ser çavan, axa, tiştê tu dibêjî, em ê bikin.

- Gava jin di erebeyê de xuya bû, ez ê herim ba erebê, hûn ê jî bidin dû min. Ez ê pê re bipeyivim. Tu ê bi lez wan gotinan dubare bikî. Tu ê bibêjî ku li vî bajarê mezin xatirê Osman axa heye.

- Ez ê bibêjim axa. Tu qet meraqan meke. Ez ê sed carî jî bibêjim.

Ev ne derew e ku.

Osman dubare kir.

- Bi dengê hê bilindtir bibêje! Gava ez herim ba jinê, divê tu jî werî ba min. Bêje, Osman axa, ma tu ê di dema kar de me bihêlî û bi ku de biçî? Em nikarin bê te karê mazatê bizîvirînin. Karê xwe bihêle êvarê û li vir bimîne. Ez ê jî ji jinikê re bibêjim li qusûrê menêre, bê min ev kar nameşe û ez ê ji erebeyê dakevim. Te fêhm kir?

- Tu qet meraqan meke, axa, Welleh ez ê bibêjim. Ma ev ne derew e ku, bê te karên vir nameşin.

Kincfiroşên din li sohbeta wan guhdarî dikirin. Ew di nav xwe de bi aqilê Osmên kenyan. Osman xwe bi xwe:

- Wê ew qehpik li ba wî nanopêjî xatirê min fêhm bike.

Paşê çavên wî vebûn, simbêlên wî yên boq tevlivyan. Cigareya ku wî ji serê sibehê de dikişand, cara pêşî di kezeba wî de rûdinişt.

Dutmuş gotina dawî jî anî cih.

- Axa, got. Qet nebe were em kar bidin van pênc kesan.

Osman:

- Ma kar jî gotin e, kuro Durmuş, kî çi difiroşe bila bifiroşe, got. Bayê sor bi we neketiye, li qismetê xwe bigerin?

Durmuş bi dilşahî:

- Bi xêra te axa, got. Heta ku tu li ser serê me bî, em birçî namînin.

Gava esnafên din biryara dawî bihîstin, bi dilşahî vegeriyan ser karên xwe. Wan çend gundî ber bi koma kincan ve kişandin û anîn.

Hêla qederê ya şên, carinan mîna roja ku ji nişkê ve derdikeve, wilo tarîtiya mazatê rohnî dike. Esnafên li mazatê bê ku ew li

5i

xemgînê û dilşahiya xwe bifikirin, ew ji cihê ku maye dest bi karên xwe dikin û heyfa demê jê hiltînin.

Mîna erebevanên ku çêr dikirin, bi qamçiyên bêrehfn êş û ezab li stûyê hespên bêziman siwar dikirin. Gava qamçî bi bêînsafî li hespan diketin, çend esnafan baz didan û dihatin erebe dehf didan.

Piştî demekê, mîna sehneyeke tiyatroyê, mazat bi qedera xwe re dima. Edî zimanê ku dihate peyivandin, zimanê sûkê bû. Qerebalix mîna qutiyeke boyaxê li ser rûyê mazatê dihat reşandin. Mazat



di hundurê vê dekorê de, bi herdu deriyên xwe, mîna xeyaleke çilmisî ji qerebalixan re behsa hebûna xwe dikir.

Werger: Firat Ceweri

5\*

Dagirtina valahiyan

Bajarê Olê ji herêma me bi bîst û pênc kîlometreyan ber bi başûr bû. Bi çavên biyaniyekî, an jî ji bo kesên ku bîranînên wan yên taybetî tunebin, hema hema bêîmkan e ku ew Olê ji bajarê ku em lê dijîn, Golê, veqetînin. Çiyayê wê, daristanên wê, berfa wê, serma wê, dikanên wê yên kooperatîfan, kafeteryayên wê, hotêlên wê û jinên ku li ser lingan paşgotiniyan dikin ve, mîna ku ev herdu bajar cêwî ne. Gava hûn otomobîla xwe bajon kuçeyên Olê, »gelo ma dîsan em berepaş vegeriyan Golê« hûn ê bibêjin. Ev lihevçûyina van herdu bajarên wê we şaş û ecêbmayî bihêle. Gava em bêkar û bê mijûlî diman, me riya Olê digirt. Yek ji xeratên Norvejê yê navdar, hoste Breydok li vî bajarî dijiya. Ew nod û sê salî bû. Me li ba kalo sindoqeke kincan dabû çêkirin. Hoste Breydok bi tenê dijiya. Mala wî li serê girik bû. Wî atolyeya xwe li quncikeke baxçê xwe ava kiribû. Hoste kerr bû. Bêî ku em li derî bixin em derbasî hundur dibûn.

Her cara ku em diçûn ba wî, me ew li quncika malê, ya metbaxê, li ser qoltixê kevin rûniştî, didît. Di firaxê kevin de perçene patatan hebû. Çaydanê wî li ser êgir dikeliya. Ne xuya bû ku wî ê ew ava germ ji bo ço bi kar bianiya. Ez wilo texmîn dikim ku ew her carê wê ava germ bera destşoyê dide û dîsan ji nû ve çaydên tijî av dike û dide ser êgir. Ew bi vê yekê ji tenêtiya xwe rizgar dibû û dibû xwediyê mijûliyê.

Gava ew çav li me diket, pêşî ditirsiya û bi awirên xwe yên aciz,

aciziya xwe nîşan dida.

Mirovên kal û pîr, li vir jiyana xwe ya rojê di hundurê tenêtiyeke ku ew fêr bûne, dibuhurîn. Lê yê me em li berevajiya wê difi-

53

kirin. Em texmîn dikin, ew ji mirovên ku li wan dipirsin û li wan digerin hez dikin. Qet jî ne wilo ye. Heya niha, digel ku bi kêmanî em bîst carî hatine ba wî jî, em qet nayên bîra wî. Wî bi nêrînên xwe yê bi mereq dixwest fêr bibe, bê em kî ne û em ji bo çî hatine. Me xwe bi ser guhên wî de ditewand û me bi qîrîn digot:

- Ger te sindoqa me xelas kiribe, em hatine bibin!

- Ha, ne wilo, wî digot û hêdîka radibû ser xwe. Paşê em diketin bin milên wî û em ji pêlikan ve dadiketin jêr. Rêveçûna me ya heya atolyeya wî deh deqîqe dajot. Gava em digihîştin ber deriyê atolyeyê, dihat bîra wî ku wî mifte ji bîr kiriye. Em dîsan bi eynî giraniyê bi paş de vedigeriyan. Em li bendî wî diman ku ew mifteya xwe bibîne. Di nava vê bendemayinê de, ew dîsan li ser kevneqoltixên xwe rûdinişt, dîsan ji me dipirsî bê em ji bo çî hatine û çî dbcwazin.

- Em ji bo sindoqa xwe ya kincan hatine, bavo, ev çend meh in em li benda xelaskirina wê ne.

- Ez ji ku dibim bavê te? wî bi hêrs digot.

Hosteyê kal her tişt zû ji bîr dikir. Gava em careke din diketin binê milên wî û me ew dibir ba atolyeyê, bi destê xwe yê ku dihejiya mala xwe nîşan dida,

- Em ji ku hatine ku, digot. Em hatine, lê ji bo çî em hatine? Ez nikanim piştî vê saetê bixebitim.

Wî paşê ew gotinên xwe jî ji bîr dikir û dolabên necirandî yê ku ji bo saetên dîwêr yê mezin çêkiribûn nîşan dida. Atolye tijî

alavên bi qîmet yên xeratiyê bû. Kî dizane bê wî ew di çend salan de çêkiribûn. Dibe ku jî yên ku ew temî kiribûn, ji çûyîn û hatinê westiyabûn û dawî dawî hew hatibûn.

Sindoqa me ya kincan li wê rastê bû. Rûyekî wê bi hostenecarî hatibû xeritandin, motîvên norvecî yên gelêrî lê hatibûn neqîşandin. Lê belê ji çemilên ku wî berî bi şeş mehan lêxistibûn û pê ve tu guhertinên din di sindoqê de çênebûbû. Her cara ku em diçûn ba wî, me didît ku wî bi israr sindoq parastîye. Me ew ji rewşa sindoqê fêhm dikir. Gava hostayê kal dikete atolyeyê, wî tavi lê em ji bîr dikirin; wî bi destan der û dora xwe tev dida, ev jî ji wî re bû-  
54

bû mîna xûyekî.

Carinan wî aletek dixist destê xwe û mîna ku em ne li wir bin, wî dixwest girêkeke lingê dolabekê jê bike. Lê wî nikarîbû. Ji ber ku destê wî dihejiya, wî nikarîbû ew alet tam li girêkê bixista. Gava ez cara din jî hatibûm û min ew wilo mijûl dîtibû, min hêdîka deriyê sindoqa me ya kincan vekiribû û lê nihêrîbû. Mîxekî mezin di valahiya qorziya sindoqê re derketibû. Wê yekê em kêfxweş kiribûn, lê belê wî mîx di cihê cih de nekutabû. Gava min xwe di ser sindoqê re xwar kiribû û li dirêjahiya mîx nihêrîbû, ew hatibû ba min.

- Ev sîparîşek e, wî gotibû. Ew ê di nêzîk de werin bibin. Min hê ew xelas nekiriye.

Min hingî deriyê sindoqê girt.

- Ji kerema xwe re destê xwe medin alavên xelkê, wî got.

Wî ji bîr kiribû ku sindoq ya me ye. Paşê mîna ku ew vê şika me birastîne, ew li me zîvirî:

- Baş e, hûn hatine çî, hûn çî dbcwazin? wî ji me re got.

Ji bo ku ez wî ji jibîrkirina wî bi dûr bbcim, min xwest ez wî hêrs bikim:

- Ev sindoqa kincan ya me ye. Te niha fêhm kir? min bi dengekî bilind gotê.

Lê dîsan mîna ku wî nebihîst.

Em ewqas car çûne Olê û vegeriyane, lê me carekê jî nedîtiye ku Breydok li atolyeyê dixebite. Her cara ku em diçûn ba wî, me didît ku tepsika patatan li ber wî ye. Wî awirên xwe yê çilmisî berdidan xalekê û difikirî. Li odeya wî pirtûk û rojname jî tunebûn ku mirov ji xwe re bixwenda. Alavên wî yê rojane jî, yê norvecî î bi kêmanî pêncîsalî bûn. Te digot qey tiştê nehatibû guhertin. Qet nexuya bû bê ew kîjan saetan diçû atolya xwe û dixebitî, an jî wî kengî navbir dida karê xwe. Dîsan jî wî lingekî du metroyî yê saetekê ku ji mînakên necariyê yê herî baş bû, di demeke ne diyar de çêkiribû. Wî ew nîşanî min dida û digot:

- Divê xwediyê wê werin bibin, ez bawer dikim ew ê nebêjin xelas nebûye. Ew ê bixwazin bibin, lê niyeta min tune ye ku ez bi-  
55

dim wan. Ma ew ê çî bikin jê? Dolabeke saetê ye. Min ev ji bo çî çêkir? Gelo hêja ye? Ew ê di nava firaxan de bimire û here. Ew bêî ku li vê yekê bifikirin ew ê werin û bibin. Ji ber ku wan hertim wilo kirine. Ew bawer dikin ew dikarin bi peran her tiştî bikin. Ma pere çî ne? Mirov ji bo têrkirina zikê xwe keda xwe difiroşe. Ma ev dolaba saetan ya bi zengil bi tenê berhemeke kedê ye? Ma hêlên wê yê di ser kedê re jî tune ye? Min berê yê spehîtir çêdikirin. Ew çî tiştên spehî bûn. Kî dizane bê çî bi wan hat? Min yek jî ji wan xebatên xwe nedîtin. Ji ber ku ew êdî ne yê min in, ew yê hinin din in. Ew qoltixên ku min neqîşandibûn, maseyên

xwarin û nivîsandî; dîwan, aletên textî yê goştkişandinê,  
mengeneyên textî, lingên konsolan yê bi serşêr û dolabên xemilandî  
û neqîşandî hemû firiyan û çûn. Ew ê herin ya. . . Em çawan  
heta van rojan jiyane? Eva ku jê re dem têtê gotin, me çawa  
ew dagirt? Ev çend sal çêbûn, ma tu qet rûniştîyî û te hesab kiriye?  
Van xebatan jiyana min ji min stendin. Min wext nedît ku ez bizewicifti  
û ez bibim bavê zarokan. Min nikarîbû ez ji xwe re dost  
û hevalan jî peyda bikim. . . Nasên min, bi tenê muşteriyên min  
bûn. Min tu nêzîkahî ji aliyê wan ve jî nedît. Bîrbiriya wan, nêzîkahiya  
wan bi menfeeta wan ve bi sînor bû. Ji bo ku ew bikaribin  
erzantir ji min bikin, wan hertim şaşî û kêmasî di xebatên min  
de dîtin. Min carekê, serê Hezretî Îsa li ser darekê çêkiribû. Di ser  
re jî mişteriyê min keşeyek bû. Wî lê nihêrî, paşê »çavên wî naşibin  
yên Îsa« got. Hey Xwedê jê razî Keşe, ma kê ji me Îsa dîtiye. . .  
Bê ku tu şerm bikî, tu derewa dikî. Her hunermend tiştêkî ji serê  
xwe çêdike. Hinek Îsa bi rih (rî) çêdikin, hinek jî wî bê rih çêdikin.  
. . . Hinek jî xelekê di serê wî de bi cih dikin. Hinek jî du melean  
dbcinê. Ez baskên van melean bi rengê keskesorê boyax dikim.  
Hinek jê bi rengê şîrkî yê kulîlkan boyax dikin, hinek jî rengê  
kesk hildibijêrin.

Cara pêşî bû ku Kalo dilê xwe ji min re vedikir. Bîranînên wî  
yên ku bi zorê dihatin bîrê, bi kalîtiya wî re dibû yek. Pasê wî bêhneke  
kûr berda û peyva xwe dom kir:

- Yanî muşteriyekî din tê. Ew xwesteka xwe bi qîrîn di guhê

56

min de dibêje. Ew dibêje drama berxwedana mamasteyekî, ya askiya  
filîstînî li text bbceritîne. . . Jineke tazî. Li hember li ser lingan  
radiweste. Divê ew jina wî be. Diviyabû ez erzşikandina wan li ser

text bineqîşînim. Diviyabû her hunermend li rûmeta mirovatiyê xwedî derketa. Ew dbcwaze ez vê mijarê bikarbînim. Hem jî li ser sindoqeke kincan. Ev e, xweşbînî ye. Ez ê çawa bikaribim vê temayê li ser text çêbikim? An jî li ser neynikekê? Ma qey zindîkirina vê yekê hêsan e? Divê muşterî pozê xwe nexer nava karê hostê. Get wan destûr bidana, min ê hê xweştir çêbikira. Ez dikarim serê şêr wilo li ser text çêbikim ku, tu ê bibêjî qey diranê wî yên rastî ne. Lê em nikarin valahiya dêv çêbikin. Di karê dar (text) de valahî çênabe. Divê di devê vekirî de valahî tune be ha. . . Tu bi xwe li zehmetiya kar bifikire. Tu dbcwazî ji nevekerina devê vekirî xelas bibî. Tu ê tiştinan bikî, lê dîsan jî çênabe. Heta ku muşterî bi xwe were û bibêje: "Hoste, xwe mewestîne, karê me xelas bûye, spas." Raweste. Ya rast ew e ku tu xelasbûna kar ji wî bibihîzî. Gava ew dibêjin, tamam, ew mîna malê mîratê firaxan davêjin erebeyên xwe. Hem jî ew wilo diçin ku, ez li ber deriyê atolyeya xwe bi tenê dimînim. Ew min ji bîr dikan. Ez bi hezar zehmetiyan vedigerim mala xwe. Ez li ser qoltixa xwe rûdinê û dikenim. Ez nikarim qolinca di hundirê xwe de bi eelebekî din vemirînim. Tiştin di serê min de diwerimin. "Kêm bû" dengê dibêje, "hê tamam nebûbû." Baş e çiyê wê kêm bû? Min leşkerekî nazî dît. Gava wî li ser vî girikê ha agir dadida ew bi xedarî dikeniya. Ez di bin tesîra wî de mam. Ev dikare li ba heywanan wilo be. Ma ne wilo ye? Tu çi dibêjî?

Gava hostayê kal vegeheriya mala xwe û bêtevger û bêdeng li ser qoltixa xwe rûnişt, ew bi awirên xwe yên ku dageriyan ser patatên kelandî, dişibiya mirovekî ku bi boyaxê li ser tabloyekê hatibe boyaxkirin. Ji bo temaşevanekî ku wexta wî hebûya, gava ew ber bi tabloyeke neliberçav biçûya, wê bibûya mîna ku wî ew carekê dîtiye,

lê dîsan wenda bûye. Lê ew xuya nebûya jî, dibû mîna tabloyeke ku ji esman kindirek bi rûn dadiket û diket stûyê mehkûmê îdamê. Ger wilo nebûya, mîna ku wê her tiştî maneya xew winda

57

bikira. Te fîkra min pirsî mîrza Breydök? Bi a min tenêtî û kalîtî du tiştên ku zehmet li hev dikin. Gava mirov bi tenê ye, mirov mîna te dest bi bîranîna kevneserbûriyên xwe dike. Hinek bûyer di mêjiyê mirov de mîna coşiya kehniyekê nû dibin. Neheqiya ku li we hatiye kirin û nefêhmkirina we, bi hêzeke nû hertim zora we dibe. Ev bêhtengiyê jiyânê ye. Bi gotineke din, acizî û bêhtengî perçeyekî jiyânê ye. Rizgarbûna ji vê yekê, bi hêz û têkoşîna we ve girêdayî ye. Di destpêka tenêtiyê de, mirov nikare bûyerên bi qîmet û yên bê qîmet ji hev veqetîne. Lê her ku dem derbas dibe, ev geremola ha radiweste, bêdeng dibe. Mîna pêlên deryayê yên mirî... Tenêtî, mizgîniya dûmahiya bahozekê dide. Û êdî ew tenêtiya ku di dilê we de cihê xwe girtiye ji we re dibêje: Çawa ku hûn nikarin beştên ku li ber lehiyê tîna mîna dirankuroskan bibînin, herweha pêwîst nake ku hûn dirankurpskan jî mîna beştan bibînin.

Hoste Breydök, bi temenê xwe yê kal li derveyî jiyana Olê mabû. Ew bi salan neçûbû serê çiyayê ku xwe li bajêr rapêçabû û dişibiya mirîşkeke kurk ketî. Ew ne di wê hêza ku wî keçikên bedew ku tevliheviya spehîtiya patat û sêv sembolîze dikir û hertim di serê mirov de jîndar dima, bidîta, Ew neçûbû li Ola ku em di sehneyên tiyatroyê de dibînin, û bi avahiya polîsxaneyê wê, bankeya Beskerudê, bi parkên xwe yên tijî etebe, negeriyabû û nedîtibû. Wî folklorvanê Hallingî yê ku bi pehînekê şefqeyê ku bi serê darekî ve bû xistibû, nedîtibû. Haya wî trêna ku li ser riya Olê qulipîbû

û bîst û sê kes digel saksafonvanê navdar û diçû konserê, tunebû. Herweha wî nebihîstibû ku futbolvanên yugoslavî di seheya norveciyan de bi 3-1 zora norveciyan biribû. Gava dora mirov teng dibe, mirov ji taqet de dikeve, mirov dikeve rewşeke weha. Gava mirov not û sê saliya xwe dagirtibe, mirov dibe mîna benderuhekî ku ji dinyayê bi dûr dikeve. Lê belê têkoşîna jiyane dîsan berdewam dike û dimeşe. Ger ev têkoşîn bi çar-pênc patatan jî be...

Berî ku mirov bikeve û bimire, mirov fêrî hêrsê jî dibe. . . Mirov ji bo menfeetên xwe dest bi xweparastinê dike. Gelo ma ji temenê û bi şûn de mirov dikare çi xelas bike? Tiştên ku werin xelas dikin, 58

dikarin çi fêdeyê bigihîne wan? Kî ji me li vê yekê difikire?  
Cara dawî ku em hatin Breydök li ber derî rûniştibû. Wî xwe dabû ber tavê. Ya rastî kêfa min ji vê guhertina wî re hat. Ew vê carê ne mîna hertim mîna alavekî li ser qoltixa xwe bû. Ez bi bazdan çûm ba wî. Hê berî ku ez di guhê wî de biqîrim û wî bi destan bi milê min girt. "Bas e ku tu hatî" wî got. Min texmîn kir û ku wî ez nas kirime û min mîna norveciyên ku kêtxweşiya xwe diyar dikin "yasoooo" bi dengekî bilind got. Wilo xuyabû ku kar dikete rê. Lê çi heyf e ku vê kêfxweşiya min zêde nedomand. "Ez li vir ketime û mame, min nikarîbû xwe bigihanda malê" got. "Tu dikarî ji kerema xwe re alîkariya min bikî?" Min ew kişand ser qoltixê. Gava ew li ser qoltixê rûnişt, wî bêhneke rehet berda. Ew dîsan zindî bû. "Spas ji bo ku te alîkariya min kir. Te xwe ji min westand. Gelekî spas. Wekî din tu xwestekên min ji te tune" got. Breydök bi kubarî "Heydê, karê te qediya, tu çi li wir rawestiyayî. Here" dixwest bibêje.

Gava wî dît ku ez ji cihê xwe tevnalivim, wî di qoltixê xwe de



epişand ser hev. Te digot qey dawî li hebûna wî hat.

"Breydök, ma sindoq xelas bûye?" min bi dengekî bilind gotê.

"Ez hatime ku wê bibim."

"Ma bi rastî xelas bûye, ma tu ê wê bibî?" got. Wî tiştên ku berî bi kêliyê gotibûn ji bîr kiribûn. Ew ji ser qoltixê rabû ser xwe.

Di hundurê çavên wî de ronahiyeke dilşahiyê xuya dikir. . . "Çi baş e, çi baş e. Heydê, rahêjê û bibe." Ez keti bin milê wî. "Mifita derî ji bîr meke" min gotê. "Na, na, mifte di bêrîka min de ye.

Min dizanîbû hûn ê bihatina. Min hertişt hazir kiribû. Heydê em herin" got. Em heta atolyeyê meşyan. Ew li ber derî li bêrîkên xwe geriya. Mifte nexuyabû. Tam wextî min ew vejeranda malê, wî destê xwe avêt destikê derî. Wî destik zîvirand, derî vebû. "Ji xwe ev derî her vekiriye" wî got. "Gava mişteriyên min tên alavên xwe dibin, ew fêrî vê rastiye dibin. Baş e ku hin tişt wilo ne. Wer ku ew min dibin û tînin, ew jî mîna min diwestin. Ev westandin dike ku mişteriyên min bêtir bi alavên ku dikirin re bêne girêdan. Çawa ku gava mirov alavekî dicibîne û tavilê pereyan dihejmêre  
59

destên xwedyê mal, ne hunerek e, hostayê ku rewşên ji peran wêdetir tiştin ava neke jî, ne tu hosta ye."

Gava em ketin hundurê atolyeyê, çavên Breydök yên bêruh dîsan biriqîn. "Gava sindoq diçe, ew valahiya sindoqê heye ya, a ew valahî ye ya ku huzûrê dide hostayên mîna min" got.

"Lê belê tu û yên mîna te, hûn pê ketine û valahiyên malên xwe yên ku we ji bêhtengiyê difetisînin, dadigirin. Gava hûn alavekî datînin qunceke mala xwe, bêhna we fireh dibe. Ev çi adeteke ecêb e."

Gava me haziriyê derxistina sindoqê dikir, jina min "Ka raweste,

ma em ê vê sindoqa netemambûyî bibin ku?" got. "Ez vê danaynim tu dera malê" bi acizî got. Heqê wê bû. Ji ber ku li Norvecê, alavên bi qusûr ne hêjabûn tiştêkî. Alavên wilo di şahiya santansê (roja herî dirêj) de, li meydana bajêr li ser têne kom kirin û têne şewitandin. "Tu çi dibêjî bibêje, ê min ez ê vê sindoqê bibim. Dibe ku ev berhema dawî ya hostayekî navdar be. . . Ma li dinyayê bi koman romanên nîvcîmayî, senfoniyan netemambûyî û tablo û hêkelên nîvcîmayî tunene? Ev jî yek ji wan e. . ." min gotê. Min sindoq hemêz kir. Breydök li ber derî li me dinihêrî. Min nikarîbû sindoqa derxista, ew ji derî mestir bû. Derxistina sindoqê bêîmkan bû. Gava hostayê kal çav li berxwedana min ket, keniya. "Ancax tu wê di pencerê re derxînî, ew bi tu riyên din dernakeve." Wî mîna zarokêkî xwe hol dikr, dikir ku ji kêfa bifire. "Hertim vê şaşiyê dikin, nizanin." digot. "Ev derî bi tenê ji bo mirovan hatiye çêkirin, ne ji bo alavan e."

Min bi zehmetî hemû alavên hostê, berhemên wî yên ku nîvcî mane, li nava odê civandin. Vê yeka han gelek wext girt. Ji bo ku ez bikarim sindoqê di pencerê re derxim, min kedeke mezin xerc kir. Ez di xwêdanê de mabûm. Min pasê atolye wek berê kir. Breydök li ser kursiyê rûniştibû û difikirî. Êdî wî guh nedida kirinên min... Gava kar xelas bû "We atolyeya min ediland, hertiş baş bû, ji bo vê gelekî spas" got. Car caran Herness ev kar dikir. Lê ji mêj ve ye ew nehatiye. Ez bawer dikim ew çûye masiyan. Ew pir hez dike ku ji gola Hoftunê masiyan bigire. Ew peyakî wek be-

60  
razekî ye. Cara dawî ew du sal berê hatibû vir. Ma dem çi ye? Du sal mîna do ye. . . Ji ber ku wî deynê xwe nedaye ew nayê. Ez bi vê dizanim. Ew bi xwe nayê, lê yekî ji berdêla xwe dişîne. Xuyaye niha

jî tu ji berdêla xwe şandiye. Ew çi qurnaz e ne wilo? Spasên min bigihînin Herness û jê re bêjin ku dostaniya ji bo peran çiqasî bêaqilî be, dijminatiya wê jî ewqasî bêmane ye. Ji kerema xwe re vêjêrebibêjin."

Piştî ku min Breydök nas kir, ji bo min taybetmendiyeke bajarê Olê çêbû. Edî min hew bajarê ku ez lê dijiyam û ev bajar beramberî hev kirin.

Werger: Firat Ceweri

61

Sihêrbaz, ez û mirovê sêyem

Bi destmalên xwe yên rengîn sihêrbazî dikir. Komê zarok li dora wî kom bûbûn. Ew mîna her car cidî bû. "Hokus, pokus" digot, bi destekî toz dawdişand, bi destê din jî rengê destmalan diguhert. Kevok û kêroşk li benda dora xwe bûn. Sihêrbaz hê ew nîşan nedabûn. Ne xuyabû bê van heywanan wê çi bikira. Bala herkesî li ser wan bû. Me ê piştî kêliyêkê hunera wan bidîta. Yê sihêrbaz yekî rihtûj bû. Wî şaşikeke şêxan dabû serê xwe. Spîkên çavên wî mezin dibûn, bi vê yekê wî qîmet dida kirinên xwe.

Kes têkilî vê hêla wî nedibû. Yên ku li wir kom bûbûn kesîtiya wî ji mêj ve qebûl kiribûn. Ew toza sihêrbaziyê ku wî carinan ji bêrîka xwe derdixist û dawdişand, mîna ku bêqîmet e dixuya. Temaşevan li bendî encamê radiwestiyari, pêşî devên wan bi heyranî vedibûn, paşê ew dikeniyên û li çepikan dbcistin. Sihêrbaz dbcwest bûyerên ku mîna xelean bi hev ve ne, dom bike. Gava wî carina bersiva pirsên temaşevanan dida, ew li derengmayîna destê xwe yê çepê jî hayî dibû. "Ev ne karê aqila ye, gelî temaşevanan. Nebe, nebe, hûn eynî lîstikan li malê çenekin, paşê wê jinik li we bbce" digot. Te digot qey ev deng ji sêlikekê dihat. Gava wî ev gotinên

han dubare dikirin, min didît ku ew bi xwe jî ne lê guhdarî dike ne jî baweriya wî pê heye. Ew li kesî nedifikirî. Gava ew piştî kurtedemekê ji vir bi rê bikeve û here, di serê wî de qelebalixên nû heye. Ji bo ku ew qezenca xwe ya rojê bi dest bixe, kuçe û kolanên din li benda wî bûn. Di eslê xwe ne li bende bûn. Her cihê ku ew diçûyê, ew bawer bû herkesî bi eynî balkêşiyê lê temaşe bike. Wî ê mirovên li der û dora xwe têxista çavên xwe yên girs. Ger wî wilo nekira jî çêdibû. Hewcedariya wî bi tiştê tunebû. Ew wilo dbcuya. Ji bo ku ew kêmaniyê civakê bigire, wî pêşî tiliya xwe datariî

62

ser birînan paşê jî ew dikewand. Wî lîstika xwe ya di şampiyoniya sihêrbazan de bûbû yekemîn, nîşan dida, ji bo ku ew vê qanît bike, wî ji vazoyê vala av dirijand, gava av xelas dibû wî eynî tişt tekarar dikir. Yanî ava ku ji wê vazoyê dihat rijandin xelas dibû, lê dîsan av jê dirijîya. "Sihêrbazek dikare hewcedariya welêt ya avê çareser bike" wî bi ken digot. Hîleyêke vî karî jî hebû ku me bi xwe pê nizanîbû. Kes lê nedifikirîn, şiroveyên xwe li ser tiştên ku didîtin, nedikirin. Herkes bêsebir li benda sihêrbaziyêke din bû. "Li bêrîkên xwe miqate bin, çavên we li min in, lê bila destên we li ser bêrîkên we bin" wî digot. Xuya bû ji ber vî karî carina serê wî ketibû belayê. Berê "Dizan jî li me temase dikirin. Ew ji safitiya we destkewtî dibin û perên we ji bêrîkên we derdixin û diçin. Hûn ê paşê li xwe xin, lê belê hingê dereng e." Yên ku dengê sihêrbêz dibihîstin, bi kelecana diçûriyan: "Dewam bike! Dewam bike!" Ew gotinên ku sihêrbêz ji bo miqatebûna wan digotin, xuya bû temaşevan aciz dikirin. Sihêrbêz di vê navê de hîleyêke lîstika xwe vedişart. Dibe ku jî bi min wilo dihat. Peyayekî ku li ba min rawestiyabû "Ev sihêrbaz bi her tiştî dizane, heta ew bi tiştê ku di dilê

me de jî derbas dibe, dizane" got. Lê wî qet yê sihêrbaz nas nedikir. Belkî wî cara pêşî ew didît. Ew gotin ji dilê wî hatibûn. Yê sihêrbaz got: "Ez bi herriştî nizamim, lê belê darê di destê min de dizane" got. Min meraq kir gelo wî dengê mêrikê li ba min bihîst. Ne mumkun e ku dengê mêrik çûbiyê. Baş e wî çawa bersiv da mêrik. Piştî kurtedemekê min dît ku yê sihêrbaz riha xwe miz dide. Wî xwêdana ku li eniya wî bûbû zîpik paqij dikir. Peyayê li ba min bi pistînî got: "Ev sihêrbazê ha dikare herdu seriyên dinyayê bike yek." Min li Sihêrbêz nihêrî. Ew pêşî beşişî. "Di eslê xwe de herdu seriyên dinyayê di xalekê de dibin yek" wî bersiva mêrikê li ba min da, û piştî ku wî du kujên destmalê bi hev ve girêdan û toz lê reşand, girêk li ber çavên me ji xwe ber vebûn. Vebûna girêkên destmalê em hemû ecêbmayî hiştin. Paşê Sihêrbaz "Sivikahiya dest marîfetek e, yê ku pê bizanibe ez ê kîloyek goşt jê re bikirim" got. "Hûn dizanin hevvelatîyên hêja, goşt pir buha bûye. Lê me çareyek ji vê re jî dîtiye. Em kîroşkan çêdikin. Ji bin stûkura me, ji 63

milên me kîroşk derdikevin. Ger cihê me musahît bûya me ê hesp û deve jî derxista. Lê ji bo îro ev ne mumkun e" digot. Temaşevanan ji Sihêrbêz re li çepikan dbdstin. Êdî tiştê ne xema kesî bû. Em ewqas rehet bûbûn ku qet mepirsin. Herkes bêê ku hevdu nas bikin di riya ku Sihêrbazê çêker û bi hêz vekiribû de mil di mil de dimeşyan. Ger şerek çêbibûya vî peyayî dikarîbû ji me re rêberî bikira. Di hundurê me de hîseke wilo peyda bûbû. Me bi her awayî baweriya xwe bi wî anîbû. Ev bawerî tiştê baş bû. Di vê navê de peyayê li ba min yê nenas "Ji bo ku mirov baweriyê pê bîne hê gelek wext divê" got. Ew peyakî bejindirêj û kincreş bû. Min rûyê wî nedidît. Yê Sihêrbaz dîsan riha xwe miz da. Wî destê

xwe da qedehekê. Wê tiştin bi vê qedeha camînê bihata, ji nişkê ve "Ji bo ku ez bi we bidim bawer kirin, dem jî bi ya me dike. Yê ku di lîstikên me de hîleyek ferq kiribe bila bibêje" Sihêrbêz got. Paşê wê ji qedeha camînê gurzek gulên kaxezî derxist. Dengê çepikan bilind bû. Mêrikê li ba min gotina xwe ya dawî bi dengê bilind gotibû. Yê Sihêrbaz ji ber vê xwêdan dabû. Wê gurzê gulan avêt hundurê selika li ba xwe. Cara pêşî bû ku ji cihê xwe berepêş û berepaş şewişî. Ji bo ku nekeve wê xwe bi maseya şikestî girt. Pasê ew bi ser xwe ve hat. Ji ber ku diviyabû ew bi ser xwe ve bihata. Li hemberî wê mirovên ku baweriya xwe bi wê dianîn hebûn. Diviyabû baweriya wê bi wan bihata. Yê me baweriya me bi wê dihat. Ma di hundurê vê baweriya li hember hev de çi nedibû. Min xwest ez vê di bîra wê de bînim. Di vê navê de mêrikê li ba min ez dehf dam. Te digot qey wê nedixwest ez bipeyivim. Ger wê hereketeke wilo nekira jî, ji xwe tiştên ku di setê min re dibuhurîn min ê ji Sihêrbêz re negota. Min xwest ez li mêrik bizîvirim û lê binihêrim. Bejna wê dirêj bû. Min rûyê wê nedît. Di vê navê re yê Sihêrbaz bi ser xwe ve hatibû û xwe ji lîstikeke nû re amade kiribû. Wê qala efsaneyê hindî fikir. Wê şûrê Hezretî Elî jî tevî meselê kir. Min tu pevgêradan di navbera wan de nedît. Ji ber ku min mêrikê li ba xwe kontrol fikir.

Hêleke efsaneya hindî ya balkêş hebû. Deveyên bi barên qîlên (diranên) filan, li dû kerên ku zencefîlê dikişînin, dimeşin. Ji nişkê 64

ve tiştek ji ber wan rabûye. Dawiya maye ez nizanim. Ma çiyê wê yê girîng hebû? Min ji bîr kiribû. Sihêrbêz milên xwe dirêj kiribûn û ji dûrahiyê hêzên dizî dicivand. Te digot qey niha giraniya hemû dinyayê li ser milên wê ne. Wê bi tu awayî nikarîbû ew giranî

hilgirta. Wî hevsarê keran dikişand. Lê peyayê bejin dirêj dîsan gotinek avêtibû navê. "Wê ev bibe nîşana biserneketinê. Hûn ê bibînin, ew ê ji nava vê yekê dernekeve." Tenê min ev gotinên ha bihîstibûn. Ez vê wek navê xwe dizanim. Bi celebê din nabe. Min meraq kir ka wê yê Sihêrbaz çî bersivê bide. "Hemû serfirazî ji bo me ye. Hûn ê niha bibînin bê ez ê çawan ji nava vê yekê derkevîm" got. Lê ew vê carê tam mehû bûbû. Piştî wî xûz bûbû û bêhna xwe digirt û berdida. Çavên wî yê girs di qulikên xwe de hûrik dibûn. Min dît ku ew lerizî. Ew mîna hêlkanê dihejiya. Ger wî fedî nekira, wî ê darê di destê xwe de daniya erdê û bêhna xwe berdaya. Belkî jî wî ê destên xwe biavêtina paş stûyê xwe û "herin, karê min qediya" bigota. Wî ê mîna zarokan lava bikira û bigota, min bi tenê bihêlin. Niha Sihêrbaz di rewşeke wilo de bû. Dibe ku jî bi min wilo dihat. Dengê çepikan ew ji nişkê ve zindî kir dîsan. Bêhna min hatibû ber min. Rewj hatibû rizgarkirin. Yê Sihêrbaz bi ser ketibû. Te digot qey peyayê bejindirêj ne li wir bû. Ez têgihîştibûm ku wî qîmet nedida encaman. Tenê tiştên ku wî ê bigota wî bi rêk û pêk digot, lê encamê bala wî nedikişand. Tiştê ne xema wî bû. Ez nikarim bibêjim ku wî di serê xwe de planek çêdikir û dixwest wê bibe serî. Min nikarîbû ev bida xuyakirin. Ma wekî din qey tenê diviyabû ez bi vî karî re mijûl bibûma? Lê ne xema yê din bûn. Gava ew li dû bûyereke mezin diçûn, wan qet guh nedidan tiştên hûrik û bêqîmet. Wan bi balkêşî bala xwe dabûn lîstikên Sihêrbêz. Wê ev hê çiqas bidomanda? Ma wê kesekî ku li rewşa welêt bifikirya ji nava vê qerebalixê derneketa? Yê nexweş di erebeyên textînî de can didan. Jinên nûzayî, ji ber qîrînên xwe yê di nava heriyê de şerm nedikirin. Mêr li ber jinên xwe radiwestiyan, destên xwe li sîngên xwe dbcistin û "Hey dêlika Felekê"

digotin. Em paşê dibûn bavê zarokên bêkes. Solên wan yê  
lastîkî ji lingên wan dipekiyan û ew pêxwas vedigeriyan malê. Me

65

bi destan li çongên xwe dixist, lê em nikarîbûn hêrs bibûna. "Yê  
ku îtiraz dike heye?" peyayê bejindirêj dîsan got. Bi carekê ve herdu  
destên Sihêrbêz ber bi hewa ve bûn. Ji tirsê ku ew ê vazoya di  
destê xwe de biavêje me, ez li erdê rûniştim. Ez bi meraq li benda  
encamê bûm. "Zilamek bêhiş ket" yekî got. Hinek ketin bin milên  
min û ez rakirim ser piyan. Rûyê min zipîzer bûbû. Destên  
min dihejiyan. Min nikarîbû rewşa Sihêrbêz ya ruhî bişopanda.  
Dîsan ji vazoya li hewa av dirijiya Ez fikirîm ku wî dev ji avêtina  
vazoyê berdaye. Yê ku ez rakiribûm ser piyan dîsan bi balkêşî temaşeyî  
Sihêrbêz dikirin. Kêfa min hat ku kesî zêde ez nedîtibûm.

Destê Sihêrbêz jî dilerizîn. Min paşê ev ferq kir. Belkî herikîna avê  
ji avêtina wî ya vazoyê re bûbû asteng. Cara pêşî bû ku çavên min  
û Sihêrbêz diketin hev. Wî hewl dida ku fêhm bike bê çawan bi  
wê sivikahiyê ketibûm xwarê. (Yekî din jî ku rewşê fêhm dike heye)  
divê ew fikirî be. Ji vê zirecêba qerebalixê sê kesên ku bûyer dibihîstin  
û bi bûyeran dizanîbûn hebûn. Sihêrbaz, ez û peyayê ku  
devê min nagere ez bibêjim peyayê sêyemîn. Ew peyayê bejindirêj.  
Tenê vê rewşa dawî ez ber bi Sihêrbêz ve kişandibûm. Ji berdêla  
ku ez ê bi Sihêrbêz re hêrs bibûma, min vekirî li hemberî peyayê  
sêyemîn eniyek vekir. Yê Sihêrbaz karê xwe dikir. Ew ne azad bû.  
Wî nikarîbû bi wê rewşê dev ji karê xwe berda û li riyên din bigeriya.  
Diviyabû wî qerebalix şa bikira û ji bo wê perê xwe bista.  
Li hemberî peyayê sêyemîn wekheviya me ya firsendê tunebû.  
Ger me ji wan pere bista jî, me ji bo wê hunera xwe nîşanî  
koma mirovan dida. Xwedîbûna hunereke wilo ne tiştêkî hêsan



bû. Li hemberî çavên bi sedan kesên ku li mirov dinihêre, bêî ku tu xwe bidî dest kirina sihêrbaziyê ne tişteki hêsan e. Piştî xebata bi salan bi zorê min ev huner bi dest xistibû. Baş e, ji bo çi peyayê sêyemîn dixwest li dijî me derkeve? Me dîwest ku ew bi çend gotinan ji me re qal bike. Ger me her gotinên wî dibihîstin, diviyabû wî nikarîba sir û bilindhêza me xerab bikira. Ma qey li welêt tişteki din nemabû ku mirov li ser rawestiya? Xerabî ber bi esmên ve bilind dibû. Ew ji bo çi bi van re mijûl nedibû? Pêşeroşa feqîran ne xuyabû. Me nikarîbû zarokên xwe bişanda dibistanê. Hinek ji 66

me ji ber genimê jehrî dimirin. Ma qey yekî pirsgirêkên me çareser bikira tunebû?

Cara yekemîn ku peyayê sêyemîn bi dengê şermokî peyivî:

"Heye, lê belê ez ne peyayê vî karî me." Ez di hundurê dehşetekê de bûm. Êdî ez di ser stûyê xwe re nezîvirîm û min li wî peyayê bejindirêj nenihêrî. Ger ez di ser stûyê xwe re bizîviriyama jî min ê dîsan ew nedîta. Lê ev êdî ji bo min kareki cesaretê bû. Ji bo ku ez bikaribim bêhna xwe ya ku radibû zemt bikim, mîna ku ez li xelaskerekî bigerim, min li sihêrbazê ku kevok difirandin, nihêrî.

Cemidandina awirên wî, lerza destên wî, wê nivê giraniya barê li ser milê min bibira Cara yekê bû ku wî qet guh nedayê. Wî hewl dida ku bi textê sêqorzî yê şîn hin sihêrbaziyên nû bike. Ne ku ez ji wê rewşê hêrs nebûm. Dêmek wî ez dispartim qedera min. Herçî ez im, min ew qet li hemberî peyayê sêyemîn bi tenê nedihîşt, min her ew parastibû. Baweriya min ewqasî pê hatibû ku, ger ez ne li wir bûma karê sihêrbêz xerab bû. Ma qey rast bû ku wî ez bi tenê dihiştim? Piştî ku em ketibûm nava evqas kar, me ê çawa zora peyayê sêyemîn bibira? Ev pêwîst bû. Ger em bitisiyana jî dîsan

em mecbûrî vê bûn. Mîna destpêka her karî diviyabû dawiya wê jî hebûya. Di ser re jî em bi tenê mabûn. Wan em bi tenê hiştibûn. Lê em carekê ketibûnê. Diviyabû me heta dawiyê debar bikira. Çi bibûya wê bibûya Tiştê ne di destê min de bû. Bayekî xurt em dabûn ber xwe û dibir.

Xwêdana bêçaretî û tenêtiyê di eniya min de dabû der. Ez ji destên ku ji bo çepikan radibûn û dadiketin destkewtî dibûm û min xwêdana eniya xwe pakij dikir. Digel her tiştî diviyabû sihêrbaz bi ser biketa. Ger ew bi ser neketa, wendakirin deynê stûyê me bû. Lê em ê çawan biçûna malê? Me ê çî bersiv bida zar û zêçan? Wan ê bigota heyf e. Ez ê mehçûp bibûma. Ew ê xemgîniya ku ez ji bin vî karî ranebûbûm, di dilê min de bima. Hê jî ne xema Sihêrbêz bû. Wî qedeha tîjî şîr serberjêr dikir, lê tiştê jê nedirijiya erdê. Paşê gava wî digot "hokus, pokus" û darê xwe bi qedehê dikir, vê carê şîr jê dirijiya. Ev lîstikeke ecêb bû. Ew bi xwe jî li hemberî ecêbmayîna temaşevanan di nava kêfê de mabû. Ji rûyê wî yê

67

tirş, niha kenekî jîndar dabû der. Lê hêleke vî kenî ya berdewam hebû. Te digot qey ew ê her bikene. Wê çaxê em şewitîn, em ê perîşan bibin, ev çî ye ku hatiye serê me. Kuro ji te re çî lazim e, tu çî yî. Ma te piştî xwe bi çî qewîn kir û tu ketî navbera Sihêrbêz û peyayê sêyemîn? Tu hewcedarî nanê sibehê yî. De niha ji nava vî karî derkeve, ger tu bikaribî. Ev hemû gotin ji aliyê min, ji min re dihatin gotin. Ez bi dengê xemgîn li dijî xwe dipeyivîm. Gotinên ku ji devê min derdiketin, îmkanê min çênedibû ku ez mîna deng wan bibihîzim. Gotinên ku min carinan dibihîstin jî, dilê min dixelandin. Xuyabû wê guhertinê dengê min jî dabû guherandin. Şikeke din xwe li ezîtiya min pêçabû. Gelo ev deng, dengê

peyayê sêyemîn bû? An gelo gotinên ku wî dest pê dikirin, min dawî dianîn? Min qet nikarîbû ev ji hev derxista. Ne tiştê baş e ku mirov têkeve şikan. Diviyabû min pêşî li vê pêla şikê bigirta. An na wê li ber min kortaleke nû vebûya, û ji bo ku ez neketamayê min ê hemû hêza xwe bi kar bianiya. Lê karên min yên din hebûn. Ger pevçûna bi wê bûyera mezin re bi para min diket, diviyabû min bala xwe tenê bida vê eniyê. Loma min dev ji peyva xwe bi xwe re berda.

Devjêberdana tiştê, ne xelasbûna jê bû.

Niha gotin difiryan. Sihêrbaz bi coş bû. Ew qet ne aciz bû, û şerm nedikir. Wî bi hêsanî dest û milên xwe li ba dikirin, paşê wî digot ku tiştê di bêrika çakê wî de tune ye û bêrikên pantolonê xwe berevajî dikirin... Dengê "Dewam bike, dewam bike" ji nava qelebalixê bilind dibû. Wê çaxê mafê peyayê sêyemîn hebû. Em bê sebeb bi wî re hêrs bûbûn. Sihêrbaz peyayekî ku li gorî fêda xwe tevdigeriya. Taybetmendiyeke wî ya ku ew me li hemberî hinin din biparêze tune bû. Bi wî ve girêdana me, dikarîbû bi encamên tehlûke dawî bihata. Me şaşî kiribû ku me baweriya xwe bi Sihêrbêz anîbû. Gelo peyayê bejindirêj niha çi difikirî? Gelo wî dikarîbû bi me re peymanek çêbikira? Diviya bû em li dijî Sihêrbêz bibûna yek. Em êdî di vê de bi biryar bûn. Me dikarîbû di vê oxirê de canê xwe jî bida. Me nikarîbû êşa îxanetê ji dilê xwe biavêta. Êdî bi tenê baraneke ku bi kûzan dihat, dikarîbû Sihêrbaz ji nava

68  
destên me xelas bikira Lê esman sayî bû.

Di vê navê de min xwest ez Sihêrbêz ji ser kursiyê bavêjim erdê.

"Ev ne ewqasî hêsan e" peyayê sêyemîn got. Gava ez di hundurê xwe de li bersivê digeriyam, yê Sihêrbaz "Em ne li dû karên hêsan

in, gelî hevvelatiyan, her lîstikeke me, qîmeteke mezin e" got.  
Gava wî topên biçûk li hewa winda dikirin, digot. Cara yekemîn  
ku min didît peyayê sêyemîn bi pîrçîn keniya. Di demeke ku bûyer  
bi pêş diketin, gelo çî maneya vî kenî hebû? Ma em bi tenê diman?  
Ma wî xwesteka me ya peymanê red dikir? Wê çaxê tu çareya  
me ya xelasiyê nedima. Her ku diçû dengê kenê peyayê sêyemîn  
bilindtir dibû. Tu tesîra vî dengê kirêt li der û dorê nedibû.  
Paşê ez têgihîştim ku bi tenê ez vî kenê kirêt dibihîzim. Dengê  
ecêb ku ji vî kenî derdiket, bi tenê ji bo min bû. Yên din ew nedibihîstin.  
Belkî jî ez dikeniyam. Peyayê sêyemîn ser dengên ecêb  
dadigirt. Ez ji serî heta binî di xwêdanê de mabûm. Dîsan milên  
min dest bi lerizandinê kiribûn. Min nikarîbû hefsarê kerên bi bar  
bikişandina. Diviyabû min riyeye xelasiyê bidîta. Gelo yê Sihêrbaz  
ez im? Topa ku min avêtibû hewa hê neketiye. Hê ku ez lê difikirîm  
bê ew ê kengî bikeve, ji nişkê ve bazdan kete bîra min. Min bi  
destan peyayê sêyemîn dehf da û ez li paş xwe zîvirîm û lingo bi  
qurban û min baz da. Yekî li dû min bang kir:

- Yê diz baz dide, wî bigirin!. . .

Di mista min a xwêdayî de tu cûzdan tunebû.

Min dît ku çend kes bi dû min ketine. Wan bi xezebekê li dû  
min baz didan.

Dengê dawiya maye jî "Dewam bike, dewam bike" bi qêrîn dihate  
bihîstin.

Werger: Firat Ceweri

69

Qitik

Min zanîbû ku qitik xwe di nava deviyên de vedişêrin. Çend  
zixur ji ber tîrêjên rojê dibiriqin. . . Min guh neda tiştên ku

min didîtin. Ger min bixwesta min dikarîbû cihê her tiştî biguherta. Ger ew peya ne birçî bûya û bikarîba bi min re bihata. Wî ê jî bikarîba ev hemû bidîta. Çima wî ê nedîta? Ji ber ku wî dixwest. Min bang wî kiribû. Ji ber ku wî gotibû "Her kevir di cihê xwe de giran e." Ev hevoka wî di serê min de bi cih bûbû. Celebekî wî î behskirina qitikan hebû ku we çûk datanî cihekî û hûn li tişteki din difikirîn. We radyo di çenteyê xwe de bi cih dikir û hûn bi serkaşan ve radipelikîn. Wî çî gotibû, derdê we derdê we ye. Tiştê ku wî gotibû qet nedihat bîra we. Ger mirov ji bîr kiribe û bbcwaze bîne bîra xwe. Hele li ser dikeke êxur. Di dema hirîna hespan de. Ma ev bû? Ez bi destpelînkê ber bi rastiya tal ve diçûm. Helbet wê li derekê bêhna me biçikiya. Wê tiliyêri me mîna maran li dolabên têlînî bihatina gerandin. Me ê derî vekira. Me ê bi dengekî zirav stranek bigota.

Van stranan hertim qitik tisandibûn. Hemûyan xwe ji tisan vedişartin. Edî ez hew li wan geriyam. Edî ew dikarîbûn li dora birka mermer vehewiyana. We dikarîbû resimê wan jî bikişanda. Ez ji bo zarokekî ku ji şevan ditirsiya li wan geriyabûm. Min çend heb ji wan bi saxî bigirtana. Min ê perîkên wan bi rengê şîn boyax bikira. Ew ê bişibiyana şevê. Me ê zarok fêrî rengê şînê tarî bikira. Paşê me ê dageranda reşahiyê... Ger wî peyayî negota "her kevir di cihê xwe de giran e" û ger em netirsiyana wê çî baş bibûya. Di ser re ew bi me re jî nehat. Diranê wî pê diariya. Wî aspirîn xwariye. "Ger em bi vê xwêdanê sermayê bigirin, wê karê me xerab be" digot. Ew çend caran ji mi-  
70

rinê vegeriya ye... Wî carekê xwe bi dara purtûqalan ve daliqandibû. Şaxê darê şikestiye. Min ceriband, got. Ger tiştên ku

digotin rast be, armanca min nêzîkbûna mirinê ye, digot. Nêzîkbûneke baş... Paşê dîsan ez ê ber bi jiyana xwe ya kevin ve vegerim... Loma min şaxekî zirav hîlbijart, got. Tenê stûyê wî êşiyaye. Di eslê xwe de ev ceribandineke ehmaqane bû. Gava lingên min li hewa li ba bûn, min hingî ev fêhm kir.

Wî xwe li kebabxaneyekê dîtiye. Wî du-sê porsiyon xwarin xwariye. "Ev hewcedariyeke hezkirina jiyânê bû. Min nikarîbû jinek maçî bikira?" digot. Wî zikê xwe têr kiriye... Paşê jî ew çûye kerxanê. "Ji bo min ne dûrbûna ji mirinê, lê nêzîkbûna mirinê girîng bû. Min destên xwe ber bi hewa ve bilind kirin û min paşê li sînga xwe xist."

Ew roj ev roj e ew êdî hew ji mirinê ditirse.

Wî gotibû "diranên min diêşin" ev behaneyek bû. Diranên peyayê birçî naêşe. Hurmetê nîşanî vê fikra min bidin. Ger ev ji derveyî rastiyên zanistî be jî. Ma tu ê çî wînda bikî ku tu carekê baweriya xwe bi min bînî? Ger hûn baweriya xwe bi min bînin, ez dikarim alayên xwe yê kaxezî bidim we... Hûn rûnîn û bi dilê xwe bilîzin. . . Ger dengê defê serê we xerab neke ez ê têbigihîjim ku tu mirovekî qenc î. Ez dikarim zarokê ku ji şevê jî ditirse nîşanî we bidim... Ma hûn naxwazin wî nas bikin? Hûn zanin.

Pirsgirêkên mezin derketin navê. Me nikarîbû ew ji hev veqetandina...

Min ji diya zatokê ku ji şevê ditirsiya hez dikir. Min ew di rêwîtiyeke tirênê de nas kiribû. Me şeva pêşî di hotêlekê de bi hev re derbas kir. Zarok her digiriya. Qet ne xema diya wî bû. Di ser re jî li zarokê dixist... Bê ku şerm û fedî bike, ez hemêz dikirim, devê xwe dixist devê min û ji şehwetê ji xwe diçû.

Ev jina ha li tiştê nedifikirî. Di ser re jî ew têr nedibû. Ji ber

westandina min hêrs dibû û dixwest li min bixe... Wê nizanîbû ku ew ê here ku jî. Te digot qey ew ê her li wir bimîne. Wê rewşa wê ez hêrs dikirim. Min dixwest ez ji dostaniya me têr bibim. Paşê min dixwest ez lêxim û herim. Min dixwest ez wan bi 7i

hîseke heywanî li wir bihêlim. Giryê zarokê mîna xencerekê li dilê min diket, hêlên kirêt yên kirinên me li rûyê min diket.

Ger dê lê nefikiriya jî ez li van hemûyî difikirîm. . .

Ax, ger ne ji wî peyayê birçî bûya, wê liberxwedana me zêdetir bibûya û em ê li kesîtiya xwe xwedî derketina. Wê hêsan bûya ku ez vê jinikê biqewirînim. Ya rastî ez pir fikirîm ku ez wê biqewirînim. Baş e, ew ê biçûya ku? Ax, ger wê ev bigota û ez ji meraqê xelas bibûma! Wê cihê ku em lê bû nasnedikir. Zaroka ku ji şevan ditirsiya di hemêza min de bû. Em li kuçe û kolanên bajêr geriyan. Min kuçeyên ku ez ê bi jin û zarokekê lê bigeriyama kifş kir. Rûniştin û rawestandina li odeyeke hotelê de ez dixistim bin barê berpirsiyariyê. Min ji kuçeyan hez dikir. Gava em li ber camekanan rawestiyan, min qolyeke ku li ber çavên min ket, nîşanî wê da. Ew bi kevirên şîn xemilandîbû. Ez hê li kirîn û nekirîna wê difikirîm, zarokê got "bavo" qitik xwest. Ramanên min belav bûn. Dilê min perçe bû. Min di wê kêliyê de mirin heq kiribû. Ger "hespek" bixwesta çêdibû. Lê peydakirina qitikekê ji bo min mîna peydakirina gergedanekê zehmet bû.

Jinik bi hêz bû, wê bi min dizanîbû. Em li ber pencerê bûn.

Min xwezaya bê ser û bin, di bêhnekê de ya xwe dizanîbû.

Dar, mal, esman û ewrên li esmên.

Di wê kêliyê de yekî din lê nedifikirî ku ew wisa ye an jî ne

wisa ye. Wisan hertiş bêxwedî dima. Ev e, hêza min ji vê valahiyê dihat. Evên ha bi hisî li ba min hebû. Herkes, hertiştên xwe ji min distîne. Pasê wan bi pas de dianîn û didan min. Min ew hişk zemt dikirin û dîsan ew belav dikirin.

Yên ku'xaniyên wan tunebûn, min xanî da wan, ew bi sevê li wir razan. Yên ku xwarina wan tunebû, min xwarin li wan belav kir. Wan zikê xwe têtê kirin.

Rastiyekê nîşan dida ku -di eslê xwe de- tiştê ne yê min e.

Magelo ez notirvanek bûm, ji bö ku ez wan belav bikim?

Ger wî peyayî negota ew birçî ye an jî ger min bikarîba ew têtê bikira, wê berpirsiyariya min ya hisî li vir dawî bihata.

72

Lê bi rastî jî ew birçî bû. Henek bi vê nedibû. Êşa diran miranê wî tunebû, wî ji xwe wisa digot. Lê min bi hemû hêza xwe nikarîbû ew têtê bikira. Ez bi tena serê xwe çûbûm girtina qitikan. Ev jinik nezan bû, nedîtî bû. Diviyabû wê ez neşandibama girtina qitikan, an jî ger min bixwesta jî, diviyabû wê bi stûkura min bigirta û nehiştta ku ez herim. Ger wê sê-çar caran li ser hev bigota "meçe, çi dibe meçe" , bi serê zarokê ku ji şevê ditirse, ez nediçûm. Ez sond dbcum ez nediçûm.

Jinikê zaroka xwe hilbijart. "Heydê, em hêza te bibînin. Ger baweriya te hebe, heydê qitikê bîne." Ez li kuçê mam. Ez tirsiam û tirsiam. Êdî xweza ne ya min bû. Gava kuçe û xanî çav li min diketin, wan rûyên xwe ji min ba didan. Dilê herkesî ji min li hev diket.

Gava peyayê birçî behsa fikrên xwekuştina xwe jî kir, ez êdî bi rastî pir tirsiam. Min êşa mirinê hîs kir. Mirinê mîna du destên reş piştta min miz dida. Paşê destê xwe dixist qirika min.



Spîkên çavên min mezin dibûn û qitik li ber çavên min difiriyan.  
Min dbcwest ez bi tiliyên xwe yên ku şîrkî bûne wan bigirim.  
Vê rewşa ha ez ji armanca min bi dûr nedixistim.

Baş e, piştî ku min qitik bidîta û pê ve wê çî bibûya? Min ê  
çawan ew boyax bikira û ew bişibanda şevê? Ger zarokê ku ji şevê  
ditirse, dîsan bigota "Ez ji şevê ditirsim" me ê çî bikira? Ya  
bas ew bû ku ez bi yekî bişêwiriya. Lê kes li kuçê nebamû. Ji  
avêtina pere pê ve tu riyên din tunebû. Gava mirov di erênayê  
de be, mirov vê riyê bi kar tîne. Min bi hemû hêza xwe pere  
avêt hewa. Pere bi paş de nehat. Neketina pere bûyereke li dijî  
erdkêşanê bû. Dibe ku jî li ser darê mabe. Min perakî din jî  
avêt. Hingî pere bi paj de hat û gava ket erdê dengê çingînê jê  
hat. Ez bi ser ketibûm. Pêleke dilşahiye di rûyê min de belav  
bû. Şansê me "tûra" hatibû.

Min çend caran "Tûra, tûra" li ser hev got. Min dîsan got tûra.  
Min hewl da ku ez bi bîr bînim. Li ser hev gotina min a "tûra"  
vekirîbû: Min ji bîr kiribû bê çima min pere avêtibû. Min  
73

hewl dida ku ez bînim bîra xwe. Ez ketibûm şikan. Pereyê ku  
min pêşî avêtibû bi ku de çûbû? Min paşê bihîst ku peyayê birçî  
ew girtibû. Ew ji bo kirîna nan û zeytûnan ber bi dikanê de  
direviya. Min dengê lingên wî bihîst. Ew ê bi revê ji dizîtiyê xelas  
bibûya.

Qanûnan ez diparastim, lê peyayê birçî sûcdar dikir. Wî di  
ser re gotibû "Her kevir di cihê xwe de giran e", lê ev hevoka wî  
jî derew derketibû. Kûçik lawê kûçikan mîna tajiyeke direviya.  
Ji bo ku ew nemire, wî bi hemû hêza xwe li ber xwe dida. Min  
kir nekir min nikarîbû ew bigirta.

Ez bi bêhnçikandinekê li ser şewqa heyvê rawestiyam. Min ji hêrsan tif kir. Min dixwest ez di wê kêliyê de peyayê birçî bikujim, ez jê hêrs bûbûm. Wî jî birçîbûna xwe dida pêş, xwe bi wê diparast û ber bi reşahiyê ve direviya. . .

Min dengê lingên peyayê birçî winda kir. Kêfa min li min şikestibû. Bêçaretiyê û nekirina tiştêkî ez aciz dikirim. Peyayê ku min berî bi kêliyêkê dilşahiya wî dbcwest, ez niha bi dû ketim ku wî bigitim. Ez bi vê yekê bi xwe re ketibûm berberiyê. Lê destên min vikî vala bûn. Bêî ku ez bigihîjim tu encamê ez li navê mabûm. Gava min ev fêhm kir, min ji ber xwe fedî kir. Min nedixwest ez tu derzê li şexsiyeta xwe bixim. Gotina "Min peyda nekir" ya herî hêsan bû. Li dinyayê kê mîrov hene ku ya dilê xwe bi cih tînin. Lê hejmara me kesên ku nikarîbûn ya dilê xwe bi cih bînin digihîşte milyonan.

Ez jî yek ji wan kesa me ku dixwaze hertim bi piraniyê re be. Wê rojek bihata\* sazûmaneke ku me dilşa bike, ava bibûya. Ji vegera hotelê pê ve tu çare nemabû. Xortê ku nobeta şevê digirt, li ser kursiyê di xew re çûbû. Ji bo ku ew min bibîne wî çavên xwe firkandin.

- Ha. . . Ma tu yî? Tu bi xêr hatî, şevbaş begê min.

Min bersiv neda. Ji ber ku mêrikê birçî kûçikekî dera hanê bû.

- Fermo, a ji te re cûzdanê te yê zewacê.

Kî dizane ew yê kê bû? Lê nedibû ku min ew ji destê wî ne-

74  
girta. Ez bi wî cûzdanî çûme odê. Jinik ranezabû, ew li benda min rawestiyabû.

Zaroka ku qitik dixwest ketibû xeweke kûr.

Lê diviyabû ew ji şevê bitirsiya.

Min bêsebeb xwe westandibû.

- Divê tu tavilê razê, jinikê got. Em sibe rêwî ne...

Em ê biçûna ku?

- Tu bi ku de diçî, here, min gotê.

Ez ê li vir bimînim.

Jinik keniya.

Wê qet guh nedida gotinên min. . .

- Ma tu dîsan li çî difikirî, delalê min, wê got.

- Ez nizanim, min gotê.

- Nezanî ne şerm e, heydê were razê.

Ev jidiliya jinikê tesîf li min kir. Ger min hebekî din jî li ser  
lingan li ber xwe bida, wê bihata mîna zarokekî li ber min bigeriya  
û ez têxistima nava nivînan.

Gelo ji bo çî ew wisan bi min dadiket?

Serdestiya ku li min bikira wê çî fêde bigahanda wê?

Dibe ku jî ew bi rastî li min difikirî.

Ji bo ku ew dudiliya min ferq neke, min rûpelên wî cûzdanê  
ku yê li ber hotelê dabû min di ser hev re qulipandin.

Resimê jin û mêrekî bi mohr li min dinihêrîn. Min pêşî cişc  
fêhm nekir. Gava min hê bi balkêşî lê mêze kir, min dît ku ew  
resim dişîbin min û jinika hemberî min.

Dêmek ev jin jina min bû.

Cûzdanê zewacê ev nîşan dida.

Rast bû.

Zaroka ku bi şevan ditirsiya jî zaroka me bû. Min çawan ji  
bîr kiribû.

Min zû zû kincên xwe ji xwe kirin û ez ketim nava nivînan.

Min ji şerman lihêf kişand ser serê xwe.

Diviyabû ez nedîtama.

Pir şerm bû . . .

75

- Tu vê lampê qet venamirînî, jinikê di bîra min de anî. Wê xwe di ser min re dirêj kir û pê li bişkoka spî kir.

Em di tarîtiyê de bûn.

Di serê min de çûk difiriyan.

Êdî pêwîst nedikir ku ez wan bigirim...

Werger: Firat Ceweri

76

Qesabê Toursî

Zincîrên qalind yên ruhê wê qetiyayîne. Ma tu lê hayê dibî ku tu ji peravê bi dûr dikevî, Vedia xanim?

Ger tu xwe bikî firfirok û bifirî ber perê esmanan, wê benê te biqete, wê ba te ber bi cih û kaşên nediyar ve bibe. Tu dizanî ku vekirinên bi vî celebî hertim bi talûke ne. Em ji cîhana çîrokan ya rengîn û efsûnkar dûr in. Ne lawê padîşêh yê biçûk heye, ku ji bo zewacê tîra xwe davêje bajêr û bi tesadufî keçika xweşik hildibijêre, ne jî şivanê biçûk heye ku wê hûtê heftserî bikuje û sêva sêhrê ji te re bîne. Em raste rast di nava jiyânê de ne. Di çep û rastê me re trê derbas dibin. Hertiş ji xeyalan dûr û di pergaleke rastîn de ye. Zarok jî rûniştine morîkên xwe yên şîn û kabên xwe dihejmêrin. Wan sermayên xwe pêşkêşî kar û zerarê kirine. Mezin li dû kara rojê ne. Dem tê biçûk û mezin tevî vê pergale dibin û jiyânê bi xwe re dibin û diçin. Lê tu çiqasî derveyî vê jiyânê yî; gelo şiyarbûna bajarekî ya bi sibehê xema te ye? Tehsîldêr pere dane hev, bekçî li kuça ne. Wê derzî li

zarokan bikevin. Wê muxtarê mehelê cih û demê bide xuyakirin,  
ma ev xema te ye?

Ma têr dike tu bibêjî "giraniya gomlegê min yê hesinê bes e,  
bêhna ku ez digirim di binê kezeba min de rûnanî."

"Xwekuştin zehmet bû, ji bo ku ez ji jiyânê hez dikim, min  
firarkirin maqûl dît. Ez niha mîna miroveke ku nuh hatiye dinyayê,  
li dilşahiyê digirim. Ma ev ne heqê min e?" tu dibêjî.

Heqê te ye, Vedia xanim. Jiyan xweş e. Heta ji me bê em ê  
bijîn. Tu bi riya kesixandina rojên êşdar yên paserojê, şax û kulîlkên  
nû li dara xwe ya jiyânê zêde bike. Lê belê tu çima dibêjî:

"Min biryara mirinê dabû, ew di destê min de mabû" û em ni-  
77

ha derketina nêçîra salên nû, tamandina dilşahiyên nû. Gelo çima?  
Gava tu dibêjî "Tu vê sibehê riya xwe bi mala me bixe, em ê  
herin parkê û roja ku bi ser gulan de ketiye, bi hev re bidin  
hev" tu hingî li deriyê rehetiya hundurê xwe nadî. Ger te bikarîba  
hêza xwe ya hundirîn ya ku te ber bi malzaroka xwezayê ve  
dehf dide şirove bikira, te ê hingî fêhm bikira ku te çima beramberiya  
kirîza ku te li ser rihtima Kadiköyê zêdetir dixwest.

Çavên te yên qehweyî ji şikên bêsebir mişt bûn. Ger te têxin  
rewşa te, tu ê cihê hertiştî biguherî. Te ê rahişta riyân û danîna  
serên çiyân, te ê mal û baxçe bi vir de û wir de bireşandina. Ava  
ku ji fiskiyan dipijiqî wê laşê te yê spî şil bikira. Wê hirmî ji darê  
biketana devê te. Ger peyva te li ewran bibuhure, ew ê xwe ji  
te' re bikin sî. Gava ev xwestekên te bi cih nayên, tu mîna benderuheke  
ku mafê wê tê pelçiqandin î, tu di jiyana bi xetên  
hêrsbûyî ve mişt e, tu gavên kulek davêjî. Darên bin çengên te  
liberketinên te yên nediyar dieciqînin. Ji ber vê yekê, hevokên

herî germ û herî ji dil ku ji devê te derdikevin, biyanîyê te ne û gelekî dûrî te ne.

Îro, kesekî te yê ku tu bikaribî ji tarîtiya paşerojê derxînî û bînî, tune. Tu kî yî? Tu nikarî tu rûyî di tarîtiyê de hilbijêrî.

Ma mêrê te? Ji bo ku mirov baweriya xwe bi zewaca we ya pêncsalane ya li ser tabloya xemgîniyê bîne, şahid lazim e. Ger zewaca jin û mêrekî ne girêdayî tu pefeyî be, wê çaxê divê em mikur werin ku ew pereyên ku piştî hevduberdanê te ji mêrê xwe qefaltin şûna xemgîniya bihevrebûna pêncsalane digire. Êdî ne hêjaye ku em zêde li ser zewaca we rawestin. Ji ber ku, tu nikarî tavilê bersivên pirsên ku bi van pênc salan re girêdayî ne, bidî. Xuyaye te ji bîr kiriye. Zû bi zû nayê bîra te. Bi min pêwîst nake ku mirov ji vê re bêje serxweşiya dilşahiye. Ev raste rast guhnedayin e.

Gelo nêrîna te ya dilşahiye çi ye? Ev jî diyar e. Ger te xwestibe hûn hevdu berdîn, wê çaxê sûcê mêrê te çi bû? Mirov dikare bifikire ku ew di bin serdestiya te de hatiye pelçiqandin. Ji rew-

78  
şa te ya sert jî diyar dibe ku tu jineke otorîter î. Di zewaca pênc salan de, tu aliyê ku tu pê hatibî eciqandin tune. Ev rastiye e ku di vê hevduberdanê de ya ku neheqî û zerar lê hatiye kirin ne tu yî. Ger em werin ser mêrê te, ew bêdengiya xwe ya xemgîn û belengaziya xwe bi xayîntiya te ve girê dide. Ev texmînek e, lê ger wilo be, niha wî azadiya mêrekî azad keşif kiriye. Lê berevajiya wê, ev serfiraziya ku te bi dest xistiye, îro te dixê milên qesabê toursî. Di ser re jî tu bi xûyê qesabê toursî nizanî.

Ma ew neviyê rihşîno ye? Ma mirovekî ku îlanên zewacê yên di rojnameyan de dixwîne û ruhên wînda yên mîna te li ser xwe

kom dike ye! Ev kurê xelkê ye. Herçiqa ez te miroveke windabûyî bihesibînim jî, ez qet naxwazim tu bibî hevala mirovekî ku di krîzên xwe yê ruhî de jinan dike alet û wan difetisîne û dikuje. Ger tu bawer dikî ku qesabê toursî dewlemend e û tu ê xêtir ji bêhtengiyên xwe bbcwazî, tu dixapî. Çima te di îlana xwe ya ji bo zewacê ku te şandibû ji rojnameya ICI PARIS re qala xwedîbûna xwe û çend quruşan kiribûyî? Lê ger mêrik ji bo dikana xwe ya li ber îflasê ji xwe re li sermayekî bigere? Te ev pirsên min bi rêk û pêk nebersivandin. Tu hertim xwe di pişt bûyerên ku te bi xwe afirandine de vedişêrî. Tu herî pir çî bbcwazî, ew jî li te vêl tê. Bûyerên ku wê di serê te re derbas bibin, hê ji niha ve mîna alavên muzexaneyan di hundurê bêdengiyê de ne.

Digel ku tu bi salan li Ankarayê di tiyatroya dewletê de xebitîyî jî, ez nizanim bê te rolên çawan girtine. Ger tu metodên xwespehîkirinê û windakirina qermîçokên pîrîtiyê bi kar bînî, helbet wê şansê te yê zewacê zêdetir bibe. Ne bi tenê qesabê toursî, kî be di jinê de li spehîtiyê digere. Herçî kincên te ne, ew li te fireh in. Xuyaye tu berê qelew bûyî. Tu hinê di porê xwe didî û bi lûlika germ ba didî. Baş e lê, kêmasiyên spehîtiya te ne herdemî ye. Te xwe bi van gotinan parastibû "Yên mêran ne cihêtiya wan, rû, spehîtiya laş, maneya çavên wan mirov ji rê derdixe. Spehîtiya rêveçûna jinekê, ji lixwekirina wê girîngtir e. Lê di eslê xwe de tu nizanî bê herkes çî difikire. Gava mirov li ber-

79  
beriyên ku tu tê de dijî dinihêre, mirov dibîne ku tu di nava dudiliyekê de yî. Wek mînak tu carinan tevgerên xwe li gora der û dorê eyar dikî, carinan jî tu bi tenê li hebûna xwe difikirî

û tu ji der û dora xwe nefret dikî.

"Ez di kîjan kuçê re derbas bibim, ez bi awirên nejdil tême pelçiqandin. Ji ber ku çavên mirovan yên xayin, tijî tirs û hovane ne. Zimanê wan yê kirêt heye. Divê mirov çawên wan yek bi yek derxe, zimanê ku şaş dipeyive jê bike û mirovên paqij û dilpak ji zilma wan xelas bike" tu dibêjî.

Ya ku destê te ji çareserkirina berberiya vê der û dorê sar dike çi ye? An jî gelo zehmetî ew e ku tu nikarî bi der û dorê re têkevi nava ahengekê. Ev mikurhatina dawî, bîranîna arîfeya întixara te ye. Gava te pişt a xwe dabû rihtima Kadiköyê û tu hêdî hêdî ber bi malê ve dimeşiyayî, te ê xwestibe tu wê devera ku di hundurê te de kurtûpist û paşgotiniyên têvel dike, bisewitîne û ji navê rake. Digel hemû berxwedanên te Kadiköyê dîsan li cihê xwe ye. Dibe ku îro cihê ku tu bi nefretê bi bîr tînî Vedai xanimên nû lê hene. Dibe ku polîsxaneya Kadiköyê Vedia xanimên bêhêvî ji behrê derdixin û dikişînin peravê. Lê te ev bûyer bi hêsanî derbas kir. Tu êdî gelekî dûrî Kadiköyê yî. Bi pereyên ku te ji mêrê xwe bi dest xistibûn, bêî ku tu demançeyekê an jî tenekeyên benzîne bikirî, tu li vapûra Ankarayê siwar bû û te berê xwe da Parîsê, ji berdêla ku tu li kuçeya Bahariyeyê rûnî, tu li kuçeya Vaugirardê bi cih bûyî. Ji vê yeka ha re bi rastî jî cesaret dixwest. Bi min hebekî zehmetê te ku tu ê bikaribî cesaretê li gorî pereyên xwe bidemîn û li salnemya ji bo dilşahiya xwe ya nû demekê veqetîn.

"Gava dilşahî di hundurê mirov de be, dem radiweste" tu dibêjî.

Gelo te ev hevok ji pirtûkan ji ber kiriye? Lê, wek min got, jiyana li derveyî deriyên ku me li ser xwe girtine, dest pê dike. Li kuçeyên Parîsê peyivandina te ya mîna Kleopetrayê, dilbijandina



te ya Ofelyayê çi bi dest te dixê? Hîç!

Ji bîr meke gava tu ji metroya Conventionê derket û heta odeya xwe ya biçûk tu deh deqîqan meşiyayî; gava tu ketî hun-80

durê odê jî te xwe ji westandinê avêt ser qeryoleyê xwe û tu bi îskîn giriyayî. Ma ev e rehetî û huzûra di dilê te de? Ma hevoka jiyana te ya herî xweş ev e?

"Dilşahî di destê tesadufan de ye. Divê mirov van tesadufan amade bike".

Nîvê van hêsirên te yên dilovan ji ber nekêrkiriya te ye. Ya ku tu jê re dibêjî dilşahî te bi îradeya xwe amade kir. Saetekê rûniştina te ya li qehwexaneya Le Domeyê tu deriyê hêviyê li te venekir. Berevajiya wê te dît ku çawan du xortan du keçikên biyanî ku li ser maseya te rûniştibûn qani kirin û rakirin dansê. Di eslê xwe de ji bo binketinek bû, ku çawan herdu keçikên yek ji yekê xweşiktir zû hemêza xwe ji herdu xwendevanên rengkarker re vekirin. Du maneyên êşa ku oda te dagirtiyê hene: Yek jê kompleksa xweşikbûnê, ya dudan têgihîştina te ya ku jinên ewrûpayî ji xweşikbûna xwe destkewtî nabin.

"Ez çi keçikên xweşik dibînim" tu dibêjî. "Ew dikandariyê, nanopêjiyê û şagirtiyê dikan. Keçikên wek lampeyan di hemêza reşikan û di milên karkeran de ne. Hişê mirov nagihîje vê yekê." Lê belê tu li qehwexaneya Le Domeyê li benda lawê padîşêh î: Zêretîra wî wê li nava maseya te bikeve. Hûn ê bi pêşwaziyeke bêhawe bizewicin. Hemû vala ye! Ger xelk bi tiştên ku di dilê te de derbas dibin, bizanibin, wê hemû bi te bikenin. Li vê qehwexaneyê li benda artîstên fransayî yê herî navdar raweste! Bila zarokên milyonê li maseya kêleka te wîskiyê vexwin û

rojnameyan bixwînin. Ji vê yekê ji bilî kul û xemê çî bi para te dikeve? Ma heta îro çî bi destê te ket? Ma ew peyayê ku tu vexwendî hotêlê û dît ku te qebûl nekir, bêl ku pereyê qehwê bide rabû ser xwe û çûye?

Şukur, ji bo tu şansê xwe zêdetir bikî, te zû biryara guhertina der û dora xwe da. Ji ber qehweya Le Dome tu çû baxçeyê Luxembourgê. Bi vî şiklî tu hem ji rojnameya Le Mondeyê û hem jî ji pereyê qehwê rizgar bûyî. Min jî tu li vî baxçeyê nas kiribû. Te guh dida tesadufan - tesadufê em anîbûn ba hev. Piştî min 81

li peykerê jinekê bû, ferhengê di destê min de bû û ez difikirîm. Pîrejinek di navbera me de hebû. Ez haydarê hebûna te bûm. Digel ku tu hêlên te yê ku mirov guh bidayê tunebû. Der û dora me tijî keç û jinên ciwan bû. Tu hêleke te ya ku di ser keç û jinên din re bihata girtin tunebû. Qeyikên zarokan yê biçûk di birkên mezin de avjenî dikirin.

Gava tu ji ser kursiya xwe rabû û hatî ba min, ez fikirîm gelo min tu dîtîyî an na, loma min demeke dirêj li rûyê nihêrî. Li ser rûyê te, bêhedaniya mirovê tenê ku ji mêj de li bin tava rojê rawestiyaye hebû. Destê te hêdîka dilerizî û tu bi fransiyeke xerab dipeyivî.

"Bibuhere, min tu aciz kir. Ez gerok im. Gelo tu dizanî bê muzexaneyê Lauvreyê li ku ye?"

Lê belê me eynî tişt ji jineke fransî weha dipirsî:

"Bibuhere, ji bo mirov hînî fransiyeke baş bibe tu kîjan pirtûkê pêşniyaz dikî?"

Piştî ku me bersiva vê pirsê xwe digirt, gotina,

"Gelo tu dixwazî bi min re qehweyekê vexwî? di destpêkê de

gelekî zehmet bû. Hin caran me spasî bersivên ku me digirtin dikir, û em bi rengê xwendevanan bi dûr diketin. Lê vê carê, tarîfkirina rîya muzexaneyê Louvreyê wê ne ez ne jî tu îkna bikira.

Min bi vê dizanîbû. Lê te guh neda şiroveyên pîrejinê jî, tu li ser kursiya ku min nîşan da rûnişt û te behsa hewesa xwe ya esefên dîrokî kir. Me bi hev re dizîtiya hevnasîneke nû hîs kir.

Te ji min re "Ez brezîlî me, xwendevan im, li Parîsê tiyatroyê dbcwînim" got.

Min jî:

"Ez îtalî me, resam im, ez hînî fransî dibim, min got.

Tu çiqas brezîlî, ez jî çiqasî îtalî bim, lihevçûyina me em zû kiribûn dost û berê me bi qehwexaneyê vekiribû. Di rola du biyanîyên rastî de, me ji bo welatên xwe noş dikişandin. Min li wan stranên brezîlî ku te gotin, guhdarî kir. Ji ber ku tu hunermendeke tiyatroyê bûyî, te di rola xwe de tu zehmetî nedikişand.

Te jî ji min straneke îtalî xwest, min kir û nekir ez nikarî-

82

bûm jê xelas bibûma. Nizanim gelo ji bo ku te zêde vexwaribû te ewqasî israr kir.

Gava min ev srana îtalî "Altan-sione balkon, Makarino piyano" nihurandibû, te jê hez kiribû. Lê ya rastî, strana ku te jî got, ne strana brezîlî ya rastîn bû. Di hevoka "Kurabiye, pasta çevingom çukola" de tirkî hebû.

Bê ku em bi nasnavên xwe yê rastîn bizanibin, me bi hefteyan bi hev re hevaltî kir. Heta ku te xwesteka xwe ya zewacê eşkere kir.

Ji ber ku ez ji ber sedemên siyasî nikarîbûm vegeyiyama îtalyayê, ji bo du hunermendan Parîs buhuşteke rastî bû. Tu jî gilîdarê

avûhewa Brezîlyayê ya gçrm bûyî. Te hêdî hêdî xwe dida dest. Lê em herdu jî hê jî bi avûhewa Brezîlyayê ya rastî nizanin. Dibe ku jî hunermendên tiyatroyê li Brezîlyayê ji jiyana xwe razî ne.

Min ji bo zewacê bersiveke erînê nedabû. Li gorî ku di pêvajoya hevaltiya me de bi tenê carekê min bi destê te girtibû, bi rastî jî meyla min ne li ser te bû. Zewac qet nedihat bîra min. Di ser re jî, min gelek caran dida pêşiya te û gelek caran bi saetan tu li benda xwe dihişt.

Hîsên te yên li hemberî min jî ne ewqasî kûr bûn. Tiştên ku diviyabûn dawî bihatina gotin, te di destpêkê de digotin, ji rewşa te ya esebî jî diyar dibû ku telaşekê tu diajot ser vê yekê. Tu ê bi riya zewacê ji tenêtiyê xelas bibûya. Lê ez, mîna resamekî îtalî, ger tabloyên min nehatana firotin, me ê tî û birçî li welatê xerîbiyê çî bikira? Gelo ma peyayekî ku pêşeroja wî wilo reş tu carî bi jineke ku pêşeroja wê reştir re dizewicî? Lê çawan be tu jinek î, xeyalkirin mafê te ye. Min ev yek normal dît.

Gava ez rûniştandina te ya li baxçeye Luxembourgê, ya bi înad î li eynê quncikê bi bîr tînim, ez hê jî dikenim. Bi qurnaziya jineke bi tecrube, te carinan hişê xwe baş bi kar tanî. Rengekî romantîk dayina têkiliyên me, bîranînên ku mîna mîxan di serê me de dihatin kutandin, kêfxweşiyek bû:

"Ev dekor zindî dibe: Ev dar, ev peyker, ev birk, ev gulên ren-  
83

ga reng, tijî hîs bi me re ne. Em ê heta dawiyê di hundurê vê jîndariyê de bimeşin".

Ger bi ya te bûya me ê mala xwe di quncika vî baxçeyî de ava bikira. Te ê baholên xwe yên Vaugirarê, xewliyên xwe, ew albuma

ku bi kevnesehneyên tiyatroyê ve mişt û pirtûkên Moliêr  
bianîna vir.

Pir şukur baranê dest pê kir û dawiya vê nexweşiya te û baxçeyê  
Luxembourgê hat.

Gelek xuyên te hene, ku demsala wê neyê tu dev jê bernadî.

Riya ku tu rast tê re dimeşî, ancax bahoz bikarin rûyê te ber bi  
devereke din de biguhere. Heta ku pelên payizê bi ser te de neweşin  
tu xwe ji xwestekên havînê qut nakî. Şabaş ji barana payizê  
re. Axir me Parîsa derveyê baxçe bi hev re dît. Tê bîra min,  
gava berî tu werî odeya min, min hemû alavên welêt veşartibûn.  
Min pakêtên Yenice, qutiyên loqum, şûşeyên araqiyên yên  
vala min hilanîbûn. Heta min resimên li dîwêr jî rakiribûn. Ji  
xwe ne mumkun bû ku keçikeke brezîlî, ji pakêtên Yenice, ji  
araqiya Klubê nijada min derxista. Lê ger gelek delîl biciviyana,  
jineke wek te î bi meraq dikarîbû şik bikira. Pasê, ev xweparastinên  
pasîv normal bûn û êdî ez aciz nedikirim.

Min her celeb tevdîr stendibû, berevajiya wê. Cara pêşî te  
xwe dabû dest, gava te li odeya xwe Vaugirarê qaşo xwarina  
brezîlî, karniyarik çêkiribû. Herçiqaqas resimê di salnameya dîwêr  
de ji min re biyanî nehatibû jî, lê min dîsan jî fêhm nekiribû.  
Di dema xwarinê de "bi zimanekî biyanî çiqasî zehmet e ku  
mirov hîsên xwe bîne zimên, min dbcwest ez bi te re bi zimanê  
xwe bipeyivim" te gotibû.

"Ger tu îtalî bûya" min bi ken gotibû. "Min ê jî ji te re şîrên  
evînî bixwenda."

Gava em tam serxweş bûbûn, te ji min re,

"Ez dixwazim îtalî bibihîzim" got. "Ji min re bi îtalî behsa  
evînê bike."

Ger te bi îtalî nizanîbû, tu dikarîbû bi tirkî bipeyiviya. Gava min porê te miz da, min bi zorê hin gotinên tirkî hilbijartin û 84

gotin. Befevajiya tiştên ku min gotin, di ruyê min de hewayeke romantîkî hebû.

"Xwişka min, ez li welatê xwe zewicî me. Dest û lingên min girêdayî ne. Wekî din jî ez dilşa me. Di dilê min de li hemberî te ji dilrehmiyê pê ve tişteki din tune. Çawan be em heval in, em demeke xweş bi hev re derbas dikin. Zêdeyî temen e, ev jî bêîmkan e."

Tu pêşî keniya, ev kenekî dînoke bû. Piştî ku te qedeha xwe bi ser xwe da kir, te ji min re bi fransî,

"Bipeyive, got. "îtalî zimanekî xweş e, bipeyive! Ez hîsên te, ji jestên te baştir fêhm dikim. "

"Baş e" min gotibû. "Tu ji min mezintir î xwişka delal. Tu çi ji hîsên min fêhm dikî fêhm bike! Ger tu bawer dikî ku ez ê dil têkevim te, tu jina dinyayê ya herî bêaqil î."

"Ji kerema xwe re bipeyive."

"Ev e, ez dipeyivim. Ger te bizanîba ev rojên ku te bi hevaltî bi min re buhurandine rojên windabûyî ne, gelo tu ê dîsan wilo ji dil bikeniyayî?" min gotê.

Tu bi hîke hîk keniyabû.

Paşê jî te bi tirkî gotibû:

"Efê ez ê bikenim, ez ê bikenim."

Hê jî dengê wî kenê te yê dînoke di guhên min de ye. Di hundurê odeya te ya biçûk de êş û xemgîniya sî û pênc salan hebû.

Te digot qey hemû nebiserketinên te anîne û xistine hundurê

vê odeka biçûk. Bê ku ez jî bîr bibim ez li te dixim, te dêşînim,  
te dipelçiqînim, bi gotinan te dikujim.

"Li gorî ku tu dikenî, tu hê jî bi hêvî têtî hesêb. Em ji şerefa  
vê hêviyê re vexwin, Matmazel Çerlesta" min gotibû.

Te bi jستهke esebî qedeha di destê min de avêtibû erdê û te  
bi tirkî,

"Êdî bes e, Mösyö Gittari" te gotibû. "Ez hew tehemul dikim  
ku li te guhdarî bikim!"

Em bi saetan peyivîn. Gava ez derengê şevê vegeyriyam odeya  
85

xwe, min dixwest ez bînim bîra xwe bê ez bi te re bi kîjan zimanî  
û li ser çî peyivî me. Herweha nayê bîra min bê tu bi kîjan  
zimanî peyivî. Tiştê ku tê bîra min ev bû:

"Li odeya te ya li Ankara Ulus Meydani, Istanbul Kadiköy Iskelesi  
hebûn. Dolmîşan rêwî ber bi Taksimê dibirin. Bayê ku  
dihat bayê welêt bû. Lê ez nizanim bê tiştê ku min dît xewn bû  
ne xewn bû, ez şiyar bûm an razayîbûm.

Gelo ji sebebên ku tu gîhande qesabê toursî pareke min jî  
hebû? Kî zane?

"Êdî kes nikare min bi werîsên qalind jî ji bîra kederê ya kûr  
derxîne!" gava ku te gotibû, qet nebe ez jî yek ji wan kesan bûm  
ku min tu ajotibû bêhêvîtiyê. Gelo ma ez dixwazim ev wilo be?  
Ma ev ne nîşana jidiliya min e ku ez dixwazim tu ji xwe re ji bo  
kêfxweşiya jiyane reflekse nû peyda bikî? Ma ji bo azadiya te  
ez bi saetan nexebitîm? Qet nebe ma em bi hev re nefikirîn ji  
bo em ji sermayê xwe nexwin û em ji xwe re karekî peyda bikin?  
Lê destûra te ya kar tunebû. Min cesaret nekiribû ku ez ji  
te re bibêjim li restoranta Madam Sofiyayê bixebite. Di wan rojan

de kartpostal di destên te de bûn û tu li studyoyên meşhûr  
yên Champs-Elyseeyê digeriyayî. Ma ji bo filmekî nû wê kê kar  
bidaya te? Tiştek ji cihê kêfê jî derneket. Ma te ê li klubeyên şevê  
çi bikira? Navdarbûyina li Parîsê, di vê riyê de qezenckirina  
peran, mîna ku te texmîn dikir ne hêsan bû. Ne tu dikarîbû di  
deh saniyan de sed metroyî bazbidî, ne jî tu dikarîbû bi lingên  
xwas li ser devê şûran bimeşiyayî. Parîs, li vê digere. Hewcedariya  
temaşevanan bi mirovên duserî heye. Kêrê di zimanê xwe rake  
da ku temaşevan ji te re li çepikan bbce. Ax ger te bikarîba ev  
rastî bidîta! Ger tu nabînî jî mebîne Vedia xanim. Ma çi xêra  
wê heye ez haya te bigihînimê ku tu ketiyî kuçeyên pêşî girtî.  
Çawa be gava tu pêrgî dîwarên qalind werî tu ê bi xwe vegeerî.  
Wê çaxê em ê porê te yê hinekirî, kincên te yê fireh, ji nameyên  
qesabê toursî yê şîrane re bikin hedef. Bila destên ku  
bêhna xwînê jê tê kedera te rohnî bike. Li trêne siwar bibe û  
here! Wa ye mêrêk heqê rê jî ji te re dişîne. Hêvîdar im tu nêçî-  
86

ra xwe ya dilşahiyê li Toursê zemt bikî. Lê ji bîr meke û nameyekê  
ji min re bişîne. Dilê min qêbil nade ku tu tenê bi pêşniyazeke  
zewacê ji jiyane xêtif bixwazî. Mîna hevaleyê ku kurtehevaltiyek  
bi te re kiriye, hê jî pêşniyazên ku ez ji te re bînim hene.  
Ger te negota "Di jiyane de dostê herî ku ez dikarim baweriya  
xwe pê bînim tu yî" û ez jî tenegehîştibûma ku tu di jiyane  
de ruhekî tikûtenê yê windabûyî yî, min jî ev xwesteka bi niyeta  
herî baş ji te re venedikir û nedixwest tu vê bikî guhar û têxî  
guhê xwe.

Riya te û şansa te vekirî be Vedia xanim. Oxir be!

Werger: Firat Ceweri



## Rawestgeha Karîdesê

Pêşevanên SALUT PUBLICÊ dest bi straneke din kiribûn. Keçika dîndar ya mandolînavan, ew perçemîqa biçûk ya di destê xwe de ji bo îsa lêdixê, kalemêrê li hemberî koroyê ku hêsirên çavên li pişt berçavkên qalind paqij dike, zarî tevgera laşê pêxemberekî ku li çarmîxê bi ezap li ba dibe, dike.

(Bila dawî li dijminê xortan yê sereke, alkolê were. Wê îsa xortan ji alkolê xelas bike. Xwe bispêrin Xwedê.)

Qerebalixê, koma ku li bin baranê bû nedidîtin. Dengê tramva û klaksonan, koroya ku ji hunera muzîkê bêpar û dengê ku carinan mîna qîrînekê derdiket, ditemirand. Çend pîrejinên ku mirov nizanîbû ew ji ku hatine û ew ê bi ku de herin, li hemberî wan bû û guhdarî dikirin.

Li pêşiya meydanê, du serxweş bi deng dipeyvîn û bi şûşan araq vedbcwarin. Ew di bin dilopên baranê de şil û pil bûbûn. Pêşevanên Salut public! Digel berxwedana wan ya xuyayî, ew mîna hêkelên bêdeng bûn.

Min nikarîbû pergalek bida odeya xwe. Saeta min ya hişyarkirinê berî bi nîvsaetê ez hişyar kiribûm. Mîna her roj, sermayê cesareta min şikandibû, loma ez nikarîbûm ji nava nivînan rabûma ser xwe. Edî wexta min a ku ez taştê bixum jî nemabû. Ma min kengî taştê xwariye? Min pariyeke nanê ku li ser masê hişk bûbû xist devê xwe. Pariyê hişk bi hemû sariya xwe di qirika min de daket xwarê. Di ava cemidî de sabûnê kef nedida Sabûna ku di binê firçê de dişemitî, min hewl dida ku ez bi destê xwe yê din bigirim. Milê min dirêjî qorziya destşokê dibe û ber bi rûyê min ve dibe. Şexsiyeta min di navbera tevgerên mekanîk de eciqî ye û maye. Min

dît hilma germ ku ji devê min derdikete destê min germ dikir. Pa-  
88

şê makîna rihkurkirinê di nava tiliyên min de bi êş li ser rûyê min  
geriya. Gava ez derketim derve, min ji bîr kir ku min çawan kincên  
xwe li xwe kiriye û çi kirine. Ya bi min re hatibû bi tenê êşa  
cilêtekî bû. Gava pêla bayê sar poz û çavên min rapêça, min ew  
êşa cilêt jî ji bîr kir. Kuçe, heta cihê ku tarîtiyê dibirî, mîna berfê  
spî dikir. Bêdengiya avahiyên herdu aliyên min, mîna xeweke tirsê  
ez ditirsandim. Dibe ku jî ev tirs, tirsê tenêtiyê bû. . .

Ez çûm ber peykerê Aasthayê dil tûnc ku li parka bi peykeran  
hatibû xemilandin. Ew bi sîwana xwe ya reş û bi fîstanê xwe yê ku  
qermîçokên wê li ber bê rast nedibûn, pir kirêt dixuya. Di nava  
hemû spehîtiyê de pozê wî yê piçûk û çavên wî yên hûrik, ew ji  
yên din vediqetand. Aastha, ji ciwankeçên spehî yên başûr re azadî  
anîbû. (Divê jin di civatê de cihê xwe yê pêwîst bigire.) Wî ji bo  
vê yekê perçeyek ji jiyana xwe di girtîgehan de bihurandibû. Niha  
kevok bi serê wî yê tûnc de zelq dikin. Ew zelqa kevokan bi baranê  
tê şuştin.

Ez di xaniyekî ji wan xaniyên kal û pîran yê şîn î donzdeh qatî  
de dimînim. Emrê min şêst sal e. Ez quruşek pere nadim. Xwarina  
min tê ber min. Kincên min tîn şuştin. Ez dikarim di rojbûyinên  
xwe de du sed kesî bihewînim. Hemû mesrefê me dewlet dide.  
Em rûdinin û alayan çêdikin. Em şûşeyên şampanya diteqînin  
û em bi kelecana bîst salan mil di mil de govendê digirin. Lê hevalên  
min mirin. Ez niha bang Aastha dikim. Ez bang peykeran dikim.  
Zarokên tûncînî yên parka Frognerê jî tîn. Ji bo ku ew ji teqemeniyê  
netirsin, Aastha wan diawiqîne.

Min cigarek pêxist. Kaloyê bi popyon got ku wî di jiyana xwe

de qet cigare nekişandiye. Ji kerema xwe re court metragekê bide min ger di bêrika te hebe. Ha, wilo ha? Me bi hev re li beşa ku min ji pirtûkekê kiribû fîlm temaşe kir.

Min xwe avêt pêsîra wî, qurban. Lêxe ha. Min ew bi hatina vê dinyayê poşman kir. Min ew ji hal de xist. Ew roj ev roj e wî ga mayê xwe fîrot. Wî demançe û gule kirîn. Ew dbcwaze min bikuje. Ew dibêje ku ew ê meytê min li meydana gund dirêj bike. Ji vê re dil divê ne wilo qurban? Peyayê ku min bikuje hê ji diya xwe

89  
nebûye.

Tu vê ji kumê min re bibêje, yê din dibêje û ji bo ku xwe li ser lingan bihêle xwe bi der û dorê digire. Ev demançe ye. Çi dibe çi nabe. Kê pêşî berde wê Xwedê bide diya wî. Ger gule li kortika paş stûyê te bikeve, tu ê negihêjî ku eşeda xwe jî bînî. Tu ê mîna kûçikan bimirî.

- Ma kîjan bêaqil wê piştta xwe bidiyê?

Bêhna herdiwan jî çikiyabû, wan bi zorê xwe li ser lingan digirtin. Kalê gundî, jina xwe ya nexweş dibir ser doktor.

- Xwezî ez bimirim. . . Ez bimirim û ji vê rewşê xelas bibim, pîra ku li ser balyan dirêjkirîbû, digot.

- Çima ne rengîn e, got, wê pir xweşiktir bûya.

- Min ji bîr kiriye. Ez ê careke din rengîn bikirim.

- Ez jî kopyakê dixwazim. Ji bîr meke ha got. Gava ez herim ez ê nîşanê hevalên xwe bidim.

Ya ku di serê min de mabû, tabloyeke ne muhîm bû.

Jinikek ji bo ku nekeve xwe bi milê hezkirê xwe digirt. Ez jî ber bi deryayê ve meşiyam. Diviyabû min li vegera kamyonên karîdesan temaşe bikira. Ez li ser kevirekî şil ku di navbera du peykerên

jinên kulîmekmezin de rûniştin.

Ji balkêşiya mêyîtiya jinên rengîn yên rûbiken wêdetir, min dbcwest ez bi wan re hevaltîyê bikim. Li vê devera herî medenî, ji stasyona Jarê ji nava tiliyên min tramvay dikevin, hostesên balafirên SASê araqê pêşkêşî çavên min dikin. Her tişt xweş li hev hatibû.

Li ser her tiştî hatibû fikirandin. Li ser detayên herî biçûk jî bi kûranî hatibû fikirandin. Wê ev sazûman ji destê kesayetiya min a miweqet çi nekişîne? Min xwe mîna sûcdaran didît. Tu kî yî? Tu çi kes î? Gelo wê ji min re bigota an negota li vir karê te çi ye? Ma wê kê bigota? Ez bi wê nizamim. Min ev şika xwe, do bi şermokî ji Jhosisê re got. Divê ez sohbeta xwe ya bi wê re şirove bikim. Ev fikra miweqet di serê min de bû. Pasê ew daket heta serê tiliyên lingên min, hat û di dilê min de fûnişt. Min destê Jhosisê guvaşt. Lê qet ne xema wê bû. Ew bi Modigliani re dipeyivî. Niha tê bîra 90

min:

- Gava resam pir vedixwe, polîs wî digirin, Jhosisê gotibû.

Gava ew li qehwexaneyê Le Dome rûniştibû, wê leşkerên birîndar dîtibû.

Wê bi meraq pirsî:

- Çi bi we hat?

- Em ji koloniyên Fransayê tên.

Yê resam nikarîbû ecêbmayîna xwe veşarta. Wî bi destên xwe yên nerm rûyê xwe nixumand û qîriya: (Ji vê xerabtir nabe. Birîndarbûna bi guleyên ku li azadiya xwe ya biheq digerin. Xwedêyo, ev çi xerab e.)

Gava leşkerên birîndar ev gotinên Modiglianê bihîstin, heta ji wan hat wan li wê xistin. Mîna ku ew jî ne bes bû, wan resam girtin

û ew birin polîsyanê.

Min konttola xwe ya ruhî niha kiribû.

(Dinya dizîvire. Otobus dimeşe. Kuliyan berfê tîn xwarê. Dinya dizîvire. Otobus dimeşe. Em dîsan kuliyan berfê digirin. Hereket hemû mîna hev in. Ez niha dibêjim yên pir ber bi serketinê ve diçin. Lê kuliyan berfê? Ew jî perçeyên ku ji piraniyê dikevin. Ez dibêjim ev alema hebûnê hemû perçeyên ku ji piraniyê hatine. Vî zemanî enerjî ji piraniyan dizê û ji wê dem tê pê.)

Ez niha bi lingên lihevgeriyayî yên karîdesên ku ji deryayên dûr tîn, digirim û wan derdbcim. Şilbûneke deryayî destê min dicemidîne.

Ez li ser kevirên parkê yên cemidî ramanên xwe winda dikim.

Erê, parka belediyê, bi kursiyên xwe yên kevirî heta tu bêjî hênik bû. Siya tenêtiya min diket ser zbcuren şil. Karkerê ku şûşeyên şîr yên vala ji ber deriyên didan hev û li şûna wan yên tije datanîn, di nava pakêtên rojnameyên ku ji erebeyan diketin xwarê, winda dibû. Wê piştî kêliyêkê pêşevanên salut publicê bihata vir. Ez li quncikeke ku birêvebirê kal yê koroyê min nebîne, rûniştibûm. Ez di nava başûriyên rûbiken de bûm. Ji ber bêdengiya mirovên dora min, ji bo ku ez nebêjim "şerê dinyayê yê sêyemîn dest pê kir, hûn çi sekinîne" min bi zorê xwe girt. Bi porê zerîn û bi bejna mîna şî-9i

vê, bi kulîmekên ku di pantorê teng de pêşkêşî aştîyê dibû, ez dîn dikirim. Tevera keçên ciwan ya li ber camekanan, nazên wan, livên wan aqil ji serê min direvand. Heyfa min bi wan mirovên kubar yên dilbijokê alkolê dihat. Min pêşeroj û paşeroja mirovên li der û dora mîna navê xwe zanîbû. Şika pêşerojê li navê tunebû. Heta ku têtetina firna ku mirovan dişewitîne. Heta ku mirov bi germahiyeke du hezar derece bibe xwelî û bi kîsîkekî derkeve.

Paşê jî, mirov ê di goreke ji mermer î pêncî sentîmetreyî ya di nava gulîstanekê de di nava axê de wenda bibe û here. Mirov ê wê valahiya di navbera mirin û jiyane de bi tewreke medenî dagire. Evîndariya jiyane li vî welatî ne hêsan e. Wan jiyane baş bi kar anîne. Wan car caran peykerê miriyên xwe çêkirine. Lê wan qet peykerên siyasetvanan çênekirine.

Bi tenê fikreke koroya Salut public hebû:

Ji bo evîna îsa lêxistina têlên mandolînê, girtina mirovan ya ji hêlên wan î herî hisî ve, paşê bi sedsalan ve ber bi kûraniya dîrokê çûyîn û bibîranîna êşên pêxemberekî ku li çarmîxê hatiye xistin. Koroyê mîna nûçegêhênê mirinê dilê min diguvaşt. Ez ji ber pêşeroja xwe bi tirs dibûm.

Gava ku min her bûyera ku dihat û diçû ji bo ku ez têkilî her bûyera ku wê bihata û biçûya nekim, li ser kaxezekê dinivîsand, dilê min rehet dibû.

(Her bûyera ez dijîm, heta ev sohbeta ku niha di navbera me de derbas dibe jî, min ji Jhodis re gotibû ku ez wê du caran dijîm. Lê ew navbira yekê û dudan û cihê wê sohbeta pêşî ku me kiribû nayê bîra min.)

Ji bo min jiyandina bûyeran du caran e. Hertîş dişibiya îmajê li ser neynikeke şikestî. Min nikaribû ew kom bikira û bianîna ba hev. Min nivîsandîye. Jhodis, ji bo ku tu ji haletê ruhî xelas bibî, ez dikarim alîkariya te bikim, wî gotibû. Karê te giran e. Di ser re jî tu bêxew dimînî. Ev tişt hemû ji loma dibin.

Bêrîka min tije perçexez bûn. Min ew xistibûn rêzê. Min ew derxistin û dîSan ji nû ve di ber çav re derbas kirin. Li sînemayên vî bajarî bi tenê fîmekî dilîst. Pîreka çavşîn ne jina mêrikê rûbera-

zî bû. Min nivîsandiye. Li gorî ku min ev ji xwe re xistibûn rêzê, diviyabû min bi van bizanîba. "Tu çima evqasî bas î" ji Jhodis re gotibû. "Gelo ji bo ku hûn di hundurê huzûrê de bin?" Revena keçikê bi hilma xwe ya germ di guhê min de bi pistînê gotibû. "Belengaziya tiştên ku em dikin tune" min nivîsandibû. "Tu xwe baş bizanibî, Jhodis," min gotibûyê, "yê min ez dikarim xwe winda bikim. Ez dikarim bi te re ji cihê ku em mane dest pê bikim." Ew keniyabû. Min nivîsandiye.

Kuliyên berfê, çavên min yên hûr vekiribû. Di her çavikeke textê satrançê de, karkerên qencyê paqijî dikirin. Mîna kerekî rewan, min bi solên xwe yên qetiyayî dixwest bigihîjim neynikên mezin yên dîwaran. Feqîran birinc ji me dbcwestin. Paşê me navê "Liberez Ben Bella" li dîwaran dinivîsand.

Çekên otomatîk yên otomobîlên polîsên fransîzan ber bi me vedibûn. Me ber bi metroya St Michel ve baz dida. Dengê lingê me yê gur di taldekî de bêdeng dibû. Di valahiya tarî ya ku şivên tirênê tê de dibiriqandin, dengê miriyekî yê bi tirs jê bilind dibû: "Liberez Ben Bella!" Ez guhên xwe digirim. Min nivîsandiye.

Gava ez hemû nivîsên xwe di ber çav re derbas dikim, diviyabû min nivîsên xwe li gora vê pergalê têxista rêzê. Ji bo ku ew tevlihev nebe, diviyabû min çi bikira? Min ê pêşevanên Salut Publicê têxista ku? Jinika kasevan li ku dera pergala min ava kiribû? Bûyer ewqas zêde bûn ku, ez nedigihîştimê. Mîna qumandafekî zora wî çûbe, ji bo ez şexsiyeta xwe biparêzim, min bi xîreta li berxwedanê şûrê xwe li ba dikir. An na gava serê tê biqete, însafa kesî namîne. Pêşevanên Salut Publicê li parkê cihê xwe girtin. Keçika bi berçavk ya ku li mandolînê dbcist, bi mizrabê mandolîna xwe akord dikir. Te digot qey yên karîdesvan ne li wir bûn. Li gora pergala

xwe, ji bo ez bûyerên îroyîn li dû hevdu rêz bikim, min dest pê kir  
û li kaxeza di destê xwe de not nivîsandin. Kaloyê berpirsiyarê koroyê  
dipeyivî:

Divê keçikên me yên ku di sermayê de dondirmeya romayê  
dalêsin, bizanibin ku gunehê îsa bi wan tê.

Ji nava temaşevanan, bi tenê ji bo ku min not digirt, min bala

93

koroyê dikişand. Min dbcwest ez dîmenên bi qalindxelekên ku bi  
peravê ve bûn, bi destan bikişînim. Lê nebû. Hertiş li cihê cih bû.  
Kaloyê ku dixwest çavên xwe yên ku fireh bûbûn di pişt berçavkê  
de veşêre: "Ma hûn ê tirsaxwe bidin kê?" pirsî. Lê tu bersiv nestand.  
Ji ber ku bê navbir dipeyivî. Ji bo ku ew serxweşiya ku ji  
bextiyariya zêde hatiye pê, rawestîne, hûn hatine parka Radusetê  
ne wilo?" got. "Ma hûn ji bo vê derketine hemberî min. Wê çaxê  
herin. Heydê, ma hûn çî sekinîne? Ma te ji min re got? Bibuhure.  
Ma ez gelekî rûniştim?" Ma ez ê wekî din biçûma ku? Min ew gotina  
ku keçikên bi pantolonên blucîn di sermayê de dondirmeya  
romayê dalêsin baş di serê xwe de bi cih kir. Ev ê ji bo şikên min  
yên siberojê bibûya xala pevgerêdanê. Ez rabûm ser xwe. Min silav  
da koroya dengnexweş. Edî min ê hertiş di hundurê heyşt saetan  
de ji bîr bikira. Çavên Jhosisê di bêrika min a biçûk de bû. Min  
kaxezên xwe xistin hundurê şewqeyê xwe. Bi xêra dikanên  
rojnamefiroşan  
ez di kuçeyên fireh re derbas bûm û ber bi makîneya  
xwe ya neşên ya li fabrîkeya polayê meşiyam.

Werger: Firat Ceweri

94

Herî



Li der û dorê, erd rêz dibûn û diçûn. Bi rêngên zer ên Van Gogh bûn. Cirdonên nav bexçan xwe diqevastin û bi vî alî û wî alî de diçûn û di pişt kestekên axê de wenda dibûn. Bajar, bi baskên qulingan, heft hezar qûlaçan dûr bû. Çûk difiriyan. Bêhna axa bi catir, bi ser taht û çiyayên bilind de difuriya, û di pişt çûna wê de, peyvên nû hebûn.

-Hey lê dinyayê, ez jî li te me. Rast e, ez heme, lê çawa?

Gava ava ku sedema hatina xwe ya dinyê dît, ji bîra kir. Li rengê avê binere. Di deryayê de şîn dibe û di ser hev re diqulipe. Dibe çem û di bin daran re diherike. Li ser axê jî gewr û girik e. Wilo pesinandine av û gotine ku şiklê firaxa ku tê de ye digire. Lê mercê wê li gor dilê mirovan e. Dibe baran û bi ser wan de dibare. Bi ser bax û bexşên wan de dirije.

Kestekên axê meşa wî sexttir dikirin. Di nav wê hebûna mezin de, gavên ku ew ber bi cîhekî rûniştinê de dibirin, ew nedibirin ber deriyê qahwexanakê. Masayek û mêşên mirî ku bi ser kaxetên lîstikê de diketin jî tunebûn. Zarên tawlayê li pişt çiyayên bûn. Binê qedehên çayê yên tije, hemû hatibûn jibîrakirin. Pêşevanên civatê, îdara ku ava kiribûn diparastin. Kaxetên ji bo girtina (ên ku birina kotekê li ser wan hebû) bihatina birin, bi daktîloyên qereqolên li bajarên mezin, ên ku tîpa (b) ji wan de ketibûn hatibûn nivîsandin û berî ku bigihijin cîhê ku dê biçûnayê, di odên ku bi lempên gazê bi zorê dihatin ruhnîkirin de, bi destê serdehê cendirman bihatina erêkirin. Bê wê desthilat çawa bihata pîrozkin, bi gotina midîrê nahiyê "divê bê xwendin", bi derziyekê bi pişt kaxetê ve hatibû vekirin. Zirkêtkêke reş, ber bi xeta telefona ku bi pîlekê ve hatibû girêdan ve diçû.

Gel bi dû desthilatdaran de diçû.

Gava dewlemendên biyan digotin ku rûnê nebatî ji ê heywanan pak û çêtir e, pantolonê ku li keçika çavreş a spehî ku ji bo wilo di afîşên reklamên li dîwarên kerpîçî xistibûn de dikeniya, nedişibiya şerwalan.

Gundiyeên ku ji bo bikaribin li ba axayê xwe bi nanûzike bixebitin hatibûn tov ji bakqê bistînin û bi dû re bidin axayê xwe, ji bo ku bikaribin lê rûnin li dereke sîh digeriyan. Yekî ji wan, şewqa xwe ya dor lewitî ji serê xwe kir, avêt ser kevirekî sar û çarmêrkî rûnişt.

Zarokan, ji nîvkamyoneke ku hêkên nû dikirrîn, rojname dixwestin. Nigxwas di nav tozê de bi dû de dibeziyar lê tu tiştêk bi destê wan nediket. Peyayekî rêxistinekê, bi rik agahdariyên ji bo şiyarkirinê di derheqa komisyona xebatê de dida muxtêr. "Ah ev ji me kêr bû."

Radioyeke pîlan, di destê xortekî ku nû ji keraxiyê vagariyabû de, klameke welêt a zîz digot.

"Rê bide me em derbas bibin."

Pîrekên ku li ser kaniyê kinc bi şûnikan dişuştin, şilopilo bûn.

Dikandarên li bajarê ku bi baskên qulingan, heft hezar qûlaçan dût bû, ji bo firotina berbiskên forchette, çavşînkên û zengilên dîwaran her li bendî mişteriyan bûn. Tizbiyên karban ên zer, îsotên kesidandî yên tirşomirşo û şerbikên şeker jî bi rêzê bûn. Dikanên ku ji bo qumçokên kincên kar bifiroşin mirovên ku nanekî tenûrê û pîvazek ji xwe re dikirin xwarin bûn. Mirovên ku traktor û mekînen çinîne bi alan dixemilandin û dîlan

dikirin, mirovên dilgeş ên ji bo ku bikaribin kîspetekê û pênsed lîran ji bo kêfa dilê xwe wek xelat bidin pêlewanên ku li pêş bi navê dilîstin, hespên xwe yên Ereban ên ku bi tirî û gêzeran dihatin xwedîkirin di nav xwîn û xwêdanê de dihiştin, ew hespên hêç westiyayî bûn...

Hesabê carîn ê wan mirovên zane ku her carê dîsa wek xwe  
96

derdiket, tu guhertin di jînê de nedikirin. Xelk li wir zêdetir dibûn, carê bi rêyên serê çiyar de, du zarokên şîr dikirin cuherên ku bi du teniştên kerên barkirî ve dihatin daliqandin.

Kerên ku herdu zarokên ku di herdu cuheran de û barê xwe radigirtin, werîs û kindirên pêncî metro ên ku bi dar û teşiyên di destên pîran de hatibûn hûnan ji ser bîran dikişandin zozanan.

"Ma hûn ê çayê û kahwê vexwin? Kahwê? Ma bila şêrîn be?"

Dêhnê gund bi dû kûçikên ku tirbên zarokan vedikirin diket û gava kevirên mezin li serê hinan ji wan dixistin û îcar dikirin kaz kaz, xwe li erdê dixist û bi wan dikeniya.

"Ma tu dikarî bilêteke tiyatroyê ji min re jî bikirî?"

"Tu têkeve dorê."

Qîzên ciwan ên ku bi revandin bi dildarên xwe re direviyan û ji ber wilo jî bavên wan ew bi çiftê birîndar dikirin, bi milên xwe yên ku ji ber wilo seqet diman, dibûn jinên mêrên ku sîh salan ji wan mezintirbûn, ên ku beşdarî "şerê ûmûmî" bûbûn û êdî hêza wan a tov zuwa bûbû.

"Wîskiyêke wilo".

Sefarê ku ji bo sipîkirina sifir dihat gund û bi heqê ser benderê dixebitî, ji bo ku bi qereçiyê ku rojê xirrê bîst zarokan jê dikir re ketibû lîstikê û fen lê kiribû, nîv kîlo lehîm rastdikir.

"Gelo hûn çî dibêjin."

Hakimê ku gava çûbû kifşê qedeheke dew venexwaribû û piştî ku çûbû, ji wekîlê hêla din ê ku bi nanê nû ji tenûrê derketibû re bi înad ji bedêla Yeni Raki ve araqa Kulub dixwest re, gotibû "de rabe ser xwe lo", wek yekî suwarî derdbcistin ser gundên cîran.

Zilam xweş bawîşkiya. Ji bo ku dewşên pirtik û perçên jîna xwe ya rojê ji xwe biweşîne, destê xwe avêt serê xwe. Bi dû re li erdê rûnişt.

Ji bo ku xwe hinekî rehet bike, bi hisên xwe yên herî stewiyayî di tenêbûna xwe ramiya û xwest ku bike qîrîn lê ji nifşkê ve veciniqî:

97

Destên xwe bilind bike...!

-Tişteke nekiriye hi, gotin û pê kenîyan.

Ken ji hev zêde bû û mezin bû.

Zarokên nigxwas, kîroşka di şevqa yê sêhirbaz de tirsandibûn.

Pîrekên ku sedlib didan ser hev, bi derziyên Ereban nivişt didirûtin.

Paçên reklaman bi serê çîyan ve li ba dibûn:

-Em ê ardê şîr bidin ên ku sedsala bîstan hîna bi halê îdara bi selika gemarê dijîn.

Xebatkarên kerpîçan li ser rêya rast solên xwe bi dû xwe de dikişîşandin û herriya ku şevkê berê çêkiribûn li piştta xwe kiribûn û dikişandin.

Dengên "ka a mezin, ka a biçûk" bi xilbexilb bilind dibûn.

Êş, diçûn û dihatin û di şeveke reş a nalet a nifiran de dest pê dikirin.

"Şerm bike, ji bayê ku tozê radike şerm bike. Ji dareke ku li

dera çirravî gul dane şerm bike. Li nava erd çûkekê kurmikek girtiye devê xwe û dike bifire. Ji çûk şerm bike."

Tavilê rûyê xwe yê ku êdî zer bû, mist da:

- Wek ku ez ne ez im.

- Tu nikarî li xwe mikur neyê!

Xweza, bi temamê geşiya xwe ye. Şerm, ber bi jîna ne li rê de ye.

Werger: Siileyman Demir

98

Made In Germany

Te divê derziyên firkete bifiroşe. Te divê çivîtê, ya jî kevçiyên qunderan bifiroşe. Qutiyeke boyax û du firçan bikire û solên xelkê boyax bike. Çi gava baran bibare, bila kêfa te bê. Ji ber ku wî çaxî nesîbê te tê ber te.

-Devê xwe bibe ber ê xelkê û bibêje balîna. Bike ku gepên te biçirin. Vir anadolû ye lawo, bêyî ku mirov bike qîrîn nabe.

-Heger kal derkeve ez perên we didim we, bibêje. Gava tu kêrê didyê û diqelêsî, bila tirs bide dilê te bi xwe jî. Ma xwene tu di nava şebeş de yî, tu dê ji ku bizanibî bê çawa ye.

Wê hêdî hêdî çend kurûşên te jî çêbibin. Ma ne Ahmed jî pere wilo pere dan ser hev. Niha qulek mala wî, Erebekeke wî ya textînî û cotek hespê wî yên rehwan hene. Baran ji îstasyonê dikişîne.

"Ê ku kêfa embara xurt tîne, ew e. Tu dê çi ji Hemît efendî re bibêjî? Mêrik pêşî li kuçan bi firotina pirtiqalan dest pê kir. Niha jî di Sîloyê de kahya ye. Fîşan dibirre. Himalan cot cot dişîne ser karan. Hemû kes xwe li ber wî dadixe û stûxwar dibe. "

Gava trêna ji Hambûrgê rabû Samî û jina xwe li ber çûna min

ketin, destên xwe ji min re hejandin. Wek ku pîreka reben a avis bbcwaze di derheqa pêşeroja xwe de dilsafî be: Me ji bîra neke. Heger tu karekî daîmî bibînî ji mere binivîs û me pê bihisîn. Em ê zû siwar bibin û bîn, got. Çavên xwe bi hêvî berdabûn min. Wek ku bibêje "va te halê me dît. Tiştê ku ji destên te bê ji me re bike" dinerî. Min ji xwe re "ma gelo ez karim çî bikim" got û li kompartûmana xwe rûniştim. Îtalyayiyê hemberî min, bi fransiyêke xerab ji pîreka zer a li kêleka xwe tiştin digotin. Li qorziyê, yekî ku rojname dixwend, wek ku dbcwest xwe ji ber me veşêre, serê xwe kiribû nav 99 rûpelên wê. Keçeke ciwan, bi awirên zarokan ên pak bi hemû kesan re dibêşî. Ma kî dizanê, belkî wê bigihijta delalê xwe. Ma min ji te re negot lawo. Ji bo ku mirov bikaribe di jînê de bi ser bikeve, divê mirov bikêrhatî be. Lê divê mirov karê xwe bizanibe. Ji ticareta herî biçûk dest pê bik û hilkişê a mezin. Heger tu îro derbikan bifiroşî, tu dê sibe xan û apartmanan bifiroşî. Hin karin bixwazin nigên te bişemitînin. Lê tu "ne li wir be". Tu dê çayê bifiroşî. Li hemberî ên li hemberî xwe bişkîn. Tu çaydanê xwe tijê çaya Rîzeyê bike. Ew wê wî çaxî pelên bîhokan ên hişkirî bikar bînin. Lê wê mişterî illehî tê derxin. Bihêl bila boyaxçiyê ku bez di solan dide, çend rojên pêşî çend qurûşan ji zêdetir derxe. Heger mişterî çaya pelên bîhokan vexwe, wê zikê wî biêşe. Îcar piştî wê, roja nesîbê te ye. Sa kurên sayan, wê mişterî bibêjin. Wê wilo bîn giliyê wan li ber te bikin. Em ê hîna çî bibînin. Hindik maye ku kilê çavê me ji me bidizin. Em bi perên xwe dikevin dewsa rezîlan. Tu bi xwe, dê wek yekî ku pirr ji karê xwe emîn e, qet guh

nedî wan, hêdîka bibeşîşî û tu bersivan nedî wan.

Ez sêsema çûyî hatibûm Hambûrgê. Min bajar, kê m zêde wek ku hatibû gotin, dît. Keça alaman a bi pitik Adalheidê, ji min re "te çi baş kir ku tu hatî" got û bi destên min girt. Ew xweşiya ku min çend rojan li Parîsê bi yekê re dîtibû hat ber çavên min. Ez bêdeng rawestiyabûm. Lê ew her dipeyivî: "tu dê pirr ji Hambûrgê hez bikî. Gava malbata min te bibîne, wê pirr kêfxweş bibe. Ma te ev bedil nû kiriye. Te piştî min tolazî nekirin ne. Ma gelo delala te ya nû swêdî bû. Ji bo ku tu bikaribî bi min re xaîn bikevî, divê tu keçeke ji min spehîtir bibînî."  
-Dev ji wilo berde, Adalheidê min gotibû. Ka ji min re bibêje bê tu çawa yî.

Ez gellekî baş im. Ez wek dînan ji te hez dikim, got. Vaye tu hatî. Ez niha êdî dilgeş im.

Îtaliyê di kompartimana min de, di anîna behola min a ku min li korîdorê hiştibû de, alîkarî bi min kir. Dbcwest ku xwe bi jinika zer, wek ku yekî "centilmen" e bide naskirin. Bi ken, ioo

"ma tu tirk î" got. Ez ecêbmayî bûm. "Ez tê derdixim. Ez li çar aliyên dinyê geriyame" got. Hefteyekê li Izmîrê mabû. Bi tirkî zanîbû bibêje "yasak", "tamam", "arkadaj". Min jî, min texmîn kiribû ku tu îtalî ye, jê re got. O ew xatûna li ba te jî Danimarkî ye ne wil. "Rast e, rast e" gotin û kenîyan. Zilamê ku rûyê xwe bi rûpelên rojnamê girtibû, cara pêşî li min nerî. Min tê derdixist ku di dilê xwe de dibêje "çi karê van mirovên bêdebb di trêna ku diçe bakur de heye". Lê pîreka zer, wek ku bibêje na, em ji xwe re bipeyivin ji bo ku wext here û awirên xwe berdan min û wê bîstikê min zaroktiya xwe ya ku gava min devê

xwe dibir ber ê xelkê û bi qîrîn digot "balîna", zarokên ku firçên xwe li sindoqên xwe dixistin û digotin "ez ji we re boyax bikim camêrno", Samî û jina wî ya avis bi min didan jibîrakirin. Jinika bi awirên zarokan, gava ku bêdengiya min dît, got "ha ha ha" û hinekî keniya.

Tiştên ku li Hambûrgê bi min re bûbûn dîsa hatin bîra min. Adalheidê, "behole xwe daneyne cîhê ematîyê, deyne ba me" gotibû. "Na dûr e. Tu dbcwazî em taksîyekê bigirin." Min gotibû, na ez ê rahîjmê. Lê gotibû "nabe, em ê xwe biavêjin otobusekê". Baj e, lê ez naxwazim we aciz bikim, min gotibû. Lê "oda te hezir e. Tu de niha xwe bijo. Em ê xwarinê bi hev re bixwin. Em ê êvarê derkevin gerrê." Min, ez naxwazim li bibim bar. Madem te ji dê û bavê xwe re gotîye, ez ê jevekê tenê bimînim. Heger ez qet neyê, eyb e. "Tu dikarî heta tu bixwazî bimîni" Adalheidê bi xemgînî gotibû. Bêguman bavekî wê yê ku wê bahsa dostaniya tirkan û alamanan a çaxê jerê dinyê yê yekemîn bikira hebû. Wek ku ez navê xwe bizanibim, min texmîn dikir ku qedeheke bîra jî di destê wî de ye. Wê bi dû re gotin bibira ser jerê dinyê yê duyem û bigota: "ew roj, çî rojên kamax bûn" û wê ber zikê xênî janî min bikira. "Bombe wek baranê bi ser me de bariyabûn. Li vî bajarî kavir li ser kevir nemabû. Xwedê me hemûyan ji yekî sêyem bisitirîne."

Di wê navê re min û Adalheidê me yê bi hisên guhertî çav bidana hevdu. Wê mêrik bixwesta hîna jî bipeyive. Gellek tijtên

101

ku bigotina hebûn. Gav em ê rabûna, wî yê ew tijtên ku tên zanîn dûr û dirêj ji jina xwe re bigotina. Û gava ku em ê di derî re derbiketina, wê "bombêkirina 16-ê temûzê çî bombekirin bû"



herduyan bi hev re bigotina. "Heger me bîr nebira û em wî çaxî daneketina serdabê, wê niha ne Adalheid û ne jî em ê sax bûna. Min roja din Samî li buroya kar dîtînê nas kir. Kovareke siyasî a bi tirkî dixwend. Jina wî jî li ba wî bû. Gava min got "ez tirk im" memnûn bûn. Çar meh bûbûn ku ji tirkîyeyê hatibûn. Hîna jiman nizanîbûn. "Em çend gotinan dizanin" jina wî got. "Em ne bi qasî ku hewceye dizanin." Gellek xisara wê yekê dîtibûn. "Tu kes naxwaze kar bide min. Li gor ku ez li tirkîyê ezexanedar bûm jî, tu kes min li vir nagire depoyeke dermanan" Samî got. Jina wî jî bi gazindarî xwe tev li gotinê dikif: "em bi çi hêviyan derketibûn rê û hatibûn. Em ê îcar bi çi rûyî vegerin tirkîyeyê. Tu dövîz jî di destên me de neman. Tu kesên me yên ku em bikaribin xwe li wan bigirin jî tune ne. Çi baj e, ê te tu qet ne tenê yî" jinika reben got û Adelheida ku li ba min bû nîjanî min kir. Min, "wilo ye, lê ez bi xwe naxwazim bi tu kesan bawer bibim." "Ax, çi qasî baj e, çi baj e. Me bi xwe ne wilo kir. Em tim xelkê bawer bûn. Em xapiyan. Niha jî em nizanin bê em ê çi bikin" got bêdeng ma.

Hinan li buroya kar peydekirinê bi kaxetan dilîstin. Çend gurûp jin û mêran bi dengê bilind sohbet dikirin. Li wê buroyê, karê barkirina malan, paqijkirina berfê, ji koxikan kijandina komir û êzingan heta qatên jor û karên din ên wilo ku ji çend rojan bûn dihat dan. Karên ku ji bo bînan kirin ji buroyê re dihatin gotin, bi hoperloran dihat ejkerekirin. Ên ku dixwestin bikin, tiliya xwe bilind dikirin. Heger ji bo karekî zêdeyî ku hewce bû mijterî derbiketina, îcar li gor dora hatina wir dihatin helbijartin.

Sindoqa min a boyaxkirinê ji destê min de nediket. Gava ez

nû ji dibistanê dihatim, min wek bavê min digat dikir û diçûm li meydan û parkên bajêr digeriyam û min sol boyax dikirin.

102

Xwestina wî ku lawê xwe dewlemend û neperçiqî bibîne bû. Lê ma xelkê dihijt? Ez diçûm ku min lêxistin dixwar. "Ev der cîhê me ye. Biqejit ji vir" digotin. "Tu dê bê vir û mijteriyên me ji me bistîna ha kûçik. Her li îstasyonê avê bifiroj. Ma karekî ji ê vir pê ve tune ye?"

Sedema ku ez derketim kuçan û min êdî devê xwe dibir ber ê xelkê û digot balîna, ew pevçûn bi xwe bûn. Min karekî li gor dilê xwe dîtibû. Min kevçiyên solan jî difirotin. Min derziyên dirûnê, cilêt û jekir jî difiroto. Li gor ku ez xwediyê hinek kapîtal bûm, erebeyên piyangofirojan yên tîtik mîtikî yên destan bi min wek qonaxa dewlemendiyê ya herî jor dihat. Lê tu nabe çî derdên wan bio xwe hebûn! Gava ez ketim nav wî karî min fam kir. Piyangofirojvaniyê qet wek karekî biçûk nebînîn. Divê mirov bizanibe bi zabitên bajêr re li hav bike. Ji bo ku mirov mijteriyên bikijîne, bi paj ve stendina saetên ku mirov dê bi derewan bide xelkê, heye. Zû derxistina kaxetan ji destên ên ku bi nivîsandin û xwendinê nizanin û wî çaxî çî ji wan re derketibe jî, ji bedêla tijtê derketî ve, xapandina wan bi kevçiyekî çayê ya jî binê qedehakê, heye. Heger kêrojka ku min kirrîbû bi a min bikira û fêr bûba, belkî jî min ê bikarîba bi rehetî pere derxistina. Min kevokên sipî ên ku xwe li hewayê diqulipandin jî kirrîn. Berî ez kaxeta nesîb a ku min kiribû çar qat vekim, ew firriyan. Keda min hemû çû bi avê de.

Ê îtalî tavilê tijtê di bin zimanê xwe de got. Wê biçûya li Osloyê û li karekî bigeriya. Rûyê jinika Danimarkî tirj bû. Mêrik,

li gor ku digot, çar salan li avûstûralyayê mabû. O li gor ku digot dor neh deh salekî li kongoya belçîka mabû. "Lê ez herim ku ev ewrûpa dev ji min bernade, min dikijîne. Min bêyî ewrûpa nikarîbû bikira. Ez ji ber wilo bê pênc pere mame. îcar ez niha hêvî dikim ku ez ê li Osloyê di kejtîyekê de karekî ji xwe re bibînim" got. Jinika ciwan du caran bawijkî û çavên xwe girtin. New kifj bû bê ma diramiya ya jî radiza.

Ez û Samî, ji buroya karpeydekirine hatibûn jandin embareke li bendera Hambûrgê. Me ê wê rojê sindoqên pirtiqalên ku

103

ji îspanyayê hatibûn ji hev veqetandina, ên xerabe biavêtina. Em çil û pênc deqîqên sax mejiyabûn. Kaxetên ku buroyê dabûn me ji me stendin. "De dest bi kar bikin" gotin. Qedir dan me. Gotin "hevaleke me ya doktor li vir e. Ma tu dixwazî bibînin? Ew jî wek me wek karker dixebite." Navbira navrojê em li Fexriye xanim rast hatin. Pîrekeke dor sîh salî bû. Gelo ma serpêhatiyeke evîne ew di wir re derxistibû? Min lê nerî lê min tu tijtek jê fam nekir. Gava rojnama Hurriyetê ji çentê xwe derxist û lê nerî, "min keyayê vir qane kiriye. Ez ê heta dawiya vê demsalê li vir bixebitim" got. Samî bi hêrs: "ma îcar em" got.

"Hûn? We ji bedêla karkerên ku bi destûr betal in, ya jî ên ku nexwej in ve dixebitînin. Ez bawer nakim ku we ji du sê rojan bêtir bixebitînin. Li Hambûrgê gellek tirk hene. Ma we hin nas kirine" got û pirseke ku dora wê bû ji me kir. Samî, "erê me hin nas kirin" got û madê xwe tirj kir. Dixwest bibêje, qenciya tu kesan bi tu kesên din nabe. Xebera wî bû. Êvarê, gava herkê bîst mark di zerfêkê de dan me, me dîtin. Fexriyê berî me ji wir çûbû. Samî, "tîrekê bi tirimpêla ê keya çûye" got.

Em êvarê çûn li qahweke bi dans rûnijtin. Adalheîdê bi destên min girtibû û çavên xwe ji ên min dernedbcistin. Samî û jina xwe jî li ser masa me bûn. Me bîra xwe ya pêjî vexwar. A duyem û sêyem dan dû wê. Samî di derheqa pêjeroja xwe de ne ewle bû, lê markên ku bi keda xwe derxistibûn her hûr dikirin û xerc dikirin. Edî jina wî ketibû ber jermê. Lê guh nedida ziqitandinn wê. Vedixwar û her ku vedixwar, kêfxwejtir dibû.

"Ez ji ber vê yekê li ser rêya jîna nîvnexwey û nîvkulek im.

Bêhna me ji ber baskên me yên westiyayî çikiyaye û me li ser jaxekî daniye. Em bi dû hinek rehetî de ne. Ên li dora me tevan fantaziyên xwe kirine minminîk û li pey wan in. Min qenciya hemû kesan dixwest. Min kir û nekir tu kesan ji min bawer nekir. Tu kesan guh nedan dengê gaziya hisên dilê min ên mirovane, tu kesan li dû xwe nenerîn. Ji bo hemû kesan hezkirin û hurmet di nava min de hebû. Kî guh didyê. Min digot, heger ew jinika extiyar bihêle, ez ê rahjim selika wê. Ya ew zarok;

104

destqefilî ye, rû qefilî ye, wê xwe bigihîne ser dibistanê. Min dixwest derman bidim ên nexwej. hemû kesên ku bilêta piyango kirrîbe, pereyekî mezin bistîne. Bi baran dilgejî bibe para dilkovanan. Dilê min dibû kaniyeke qenciyan û diherikî."

Jina wî, "bes e êdî Samî, te têr vexwar" digot û li ber digeriya.

Lê bîra û orkestrayê Samî germ û xwey dikirin.

"Lê ên ku, ji wê mirovayetiya ji bo tadehiya me bi xwe li tu kesan nebe, me bi sextiyeke pirr mezin dikir re destên xwe wek ên parsekên kuçan vedikirin û tijtê ku digirtin bi dû re jî li kêfa xwe xerc dikirin. Kesayetiya wan, bû sûretên di nav çarçovan de û dîwar xemilandin. Em jî, bûn hinek boyaxa rej a ku li ser dîwarên

kerpîçan hat rejandin. Kêfxwejiya wan bû baqekî gulên  
di vazoyekê de. A me jî bû çengek herî."

-Bes e êdî Samî, ez dexîlê te me bes e.

Ji bo ez nebin jahidê êja ku jina wî dikijand, ez bi Adalheindê  
re rabûm dansê. Em nîvsaetêkê li wê navê çûn û hatin. Gava  
em vegeriyan, Samî bi destê jine xwe girtibû û hêviya pêjerojeke  
gej dida wê. Xuya dibû ku wek dînan ji hev hez dikirin û hemû  
tijt ji ber hêza wê evîna wan hatibû serê wan.

-Lê ma gelo xwejiya ku em lê digeriyan çî bû Mecîda min a  
delal, Samû digot. Ma gelo em bi xaniyekî bi qasî rawestgeheke  
otobusan asê ne qaîl bûn. Baran bi ser me de nehata bes bû.  
Gava ez êvaran ji kar bihatima tê ê çentê min wilo ji destê min  
bigirta. Wê zarokên me lê mezin bûbûna, di nav pêyên min de  
bigeriyana. Ez ê li ser sifra ku te raxistibû rûnijtima û min ê bi  
kêfxwejî li wê rijtayê bineriya. Bila hêkên qelandî di ber sucûkan  
re di nav de qet tune bûna. Wê çavên min qet li wê tirjika  
mijmijan, a ku felqên wilo mezindi nav ava wê de ji ber kevçiyê  
darîn difilitin, negeriyana. Bila qet tune bûya. Min ê nikariba  
saeta xwe ji bêrîka xwe derbixista. Wê zikê min wilo bûba  
kelik ku wê destê min nema bkarîba biketa bêrîka min û negihijta  
saeta min. Min ê darikê xwe yê ber diranan ê ku di bin saetê  
de mabû derbbcista. Darikê min wenda dibû, lê ji bo ku ez  
li ber diranên xwe yên zêr bbcebitiyama min ê darikekî derbikan  
105

zirav bikira. Bila qet tune bûya. Ew pirtikên kahwa bi kef, xefkeke  
kamax li ber qedera min vedaye. Kevokên sipî di ser min  
re difirin. Ez dinerim. Şevqa min ji ser min de dikeve. Bila qet  
tune be. Bila ev hemû tune bûna, lê bila îçek rehetî hebûya got

û gotin birrî. Samî serxwej bûbû. Digiriya. Giriye ji ber serxwejiyê bû.

-Bes e êdî, bes e. Hemû kes li me dinerin, Mecîda bi hêrs û tirsê got.

Em ji kahwê derketin. Hijê min çû ser kevçiyê darîn, saeta bêrîkan, darikê ber diranan ê ku Samî bahs dikir. GavA bayê sar li rûyê min xist, min "xweji" got û ez ricifim.

Wek ku Adalheidê qet bala xwe nedida tijtên ku bûbûn. Serê xwe danîbû ser milê min û digot:

-Xwedê tu ji min re jandiye, tu hêviya min e. Jiyan ji bo min bi te dest pê dike. Jiyan bi te re xwe j e.

Roja din bi gumana mezin ji ber vexwarinê bû ku Samî nehat buroya kar. Ez bi jandim febrîqeyeke ku tijtên dibistanan çêdikirin.

Qirdê min hebû. Ê ku ez ji bedêla wî ve çûbûm, çûbû

betlana salê. Bi kêmasî tu karî bîst rojan bbcebitî ji min re gotin.

Karê ku min ê bikira jî qet ne sext bû. Min ê rûniştî, aliyê

rastê ê pergêlê bida ber mekînê û mohra (Made in Germany) lê

bixista. Wê wê pergêlê mihendisên pêjerojê bigihandina. Wê

civateke bi ser rastiyê ve, ber bi pêj ve, ew kesên ku ji bo pêjeroja

xwe bigihandina, amade bikirana. Wê ew pergêl di destên

zarokên ku pêjeroja wan ji wan re hatibû amadekirin, di derheqa

pêşerojê de bi hêvî, kêfxwej de bigeriyana. Wê rojê, gava ew

mohr li ser wan pergêlan diket, ez li bîranînên xwe vegeyriyam.

Gotinên bavê min ên bedew hatin bîra min. Sindoqa min aboyaxê,

fîrçên min, derziyên firkete, kevçiyên qunderan, hemû

hatin û rijyan ber min. Kîrojka min a nesîb çi xemgîn û zexel

bû. Yek ji wana li Hambûrgê tune bû. Ma ka zarokên ku devê

xwe dibirin ber ên xelkê û bi qîrîn digotin "balîna" û nanê xwe

ji tahtê derdbcistin li ku bûn? Civatê, bi hêsaniya derxistina perên aborê re ew babet kar rakiribûn. Ê me bêsiûdiya me di wetê 106

ku qet nedihat texmînkirin de deriket pêjiya me. Tîpên (Made in Germany) ên bi rêzê, wê rojê çar hezar çaran ji min re, tu kî yî, tu çi yî, çi karê te li vir heye, gotin. Min ji xwe re, me tu rêbazî neda birêvebirina civata xwe. Gav li anadoluyê gundên bê doktor û bê derman hebûn, gelo min ê bi çi awayî Fexriyê xanim û Samî biparastina Heger bi rastî têrxwarina zik bûya, gelo wê li van welatan çima heta êvaran li vir û li wir biketina û bi dû karan de bigeriyana? Na. Ma ne Samî "pijek rehetî" gotibû û giriyabû. Xuyaye tijtê ku dbcwestin ew bû, ji xwe re got û Made in Germany lê xist. Mekîna alaman, bi hêsanî li got tempoya elektrîkê dbcebitî. Qet li bendî min nedima.

Hevaltiya min û Made in Germany pirr dirêj neajot. Min bi lêfa dilê xwe ew kar da Samî. Qet neba wê bîst rojan bi wî karê rehet him bêhna xwe fireh bikira û him jî tirs a jina xw a di derheqa abora xwe kirinê de sivik bikira. "Ma tijtekî wilo dibe, na" bi heter gotin, lê min dibe, dibe got û ez derketim. Min, li Kopenhagê hevaleke min a bi navê Ursula heye, hêviya min ew e, min got. Mecîda, "heger tu karekî daîmî bibînî, bijîn dû me, em ê jî bên" got.

Adalheidê bi awayekî bêhnfireh li min guhdarî kir û cara pêjî wek ku ez ji bo wê ne girîng bûm:

-Madem tu dê herî, here, got. Min fam kiribû ku tu ji min hez nakî. Lê min nedbcwest ez wê yekê bibînim.

-Ez mecbûrê kirina vê yekê me. Her çi qasî min sedemên vê yekê hene got jî, neket serê wê. Gava ew di nav mirovan de

wenda bû û çû, min bêtir di giraniya gavên xwe yên bi ser rêya qederê, ku min berê xwe dabû bûyerên ne kifj û tenêbûna xwe derxist. Çirûskên jînê di dilê min de lêdixistin. BERÊ TRENA MIN LI BAKUR BÛ.

Werger: Suleyman Demir

107

Pir

Li ba serê darê keskayî xelas dibû. îcar ezmanê jîn dest pê dikir. Şînbûna wî, stêrik vejartibûn. Şînbûn bi kişandina erdê re dadiket, wenda dibû. Rengê qahweyî, li ba destpêka xelaseka ê jîn dest pê dikir. Rewja rengê qahweyî hildiwejiya. Bê jerm û bê erz palpêyekê dest pê dikir. Dieciqî, diperçiqî û bi nasnameya ku tu destên lewitî negihabûnê dirêj dibû. Rengê qahweyî "wer bi vir de, wer bi vir de, dêlikê, xayînê" bi awayekî lewitî digot. Tevlihevbûn, di nav erênayekê de bû. Qeljên jejqorzî jermezariyeke wilo bûn ku, çikandina avê, jê re "heyfa te" digot. Rengê zer qolincî dibû. Di ser hev re diqulpt. Lê dbcistin. Rengê zer dibû tûpijk. Diperçiqandin. Zer, dibû miriyek. Pijî mirî edî jîn dest pê dikir. Şîn fireh dibû. Ezmanê jîn ê bi xumam dibejijî. "Bilindiya me, dera ku destê me nagihijyê, bila ruhê me bi qurbana te be" digotin. Şînbûnê guhdarî nedikir. Tijt bi bédengiya jînbûnê ve diman, hêviya xwe bi bilindiyê ve girêk didan. "Spehîbûnên ku çavên me dibînin ji bo me ne" yekî digot. Jîna xwe ya bê mane wilo dikir bi naverok. "Feza jîn a me?" "Tijîten ku em bi hêza çavan di bînin, di kefên destên me de ne û ên mene." "Divê bibin ên me." Bi dû re devê ferdan vedibû û doja ereban a rahijîtinê dihat hesab kirin. Qeweta ragirtina jerîtan dihat hesabandin. Pêlwanên ku zend û bend dinepixandin,



boksorên raûnda nehan û jifêrên ku bi fitêzê çaran di kajikan re hildikijyan, ji gotina ku li jor bi nepoxên jîn hatibû nivîsandin re, li çepikan dbcistin. "Jîn, di bin nigên pisîka ku ji bo nêçîrê veketiye, de ye."

Serê bennê wê, bi nepaxeke ku dimijt û berdida, bi babetekî dêliyê ve hatibû girêdan.

BI KURTÎ: tijt, bi êrjên ji kemînê diçûn diketin nav jînbû-

108

nê. Wê bi cefil pirtik bidana hev.

Giranî li ser benderuhên qahweyî bû. Ên ku "bin dest û nigên me, pîsiya me, rûrejiya me ne" digotin, kambûna rengê qahweyî yên din ji hev dervedixistin. Rengê qahweyî di buhayê rengê cevrikên kûçikande dihat hesap kirin. Lê ji çi bêzariya ku heye zarokek derdiket. Li dera girrik dinyayekê dest pê dikir. Rengê qahweyî xwarinên xwe didan. Rengê qahweyî avên xwe didan. Rengê qahweyî malên xwe didan. Hemû didan. Tijtek jê te nedima. Rengê qahweyî bi halê westiyayî nikarîbû bimejiya. Barekî giran lê bû. Barekî giran di bin nigên wî de bû. "Bide me jî" digotin. "Bide me jî". Rengê qahweyî nikarîbû bida. Ji ber ku nikarîbû bida jerm dikir. "Yuh rengê qahweyî, jerm bike rengê qahweyî. Lawo tu kor bibî, êj di çav û qudûmên te keve." Tif dikirinê. "Tu ne hêjayî pênc peran hey tirrek. Me çawa bi te bawerkir."

BI KURTÎ: Dilgejkirina piraniyê karekî sext bû. Zeyta rej (zaç) a li dikana ê tenekevan, di karekî bi merc de dixebitî. Lê ji rengê qahweyî her tijt dihatin xwestin.

Pira Tereblîn, li cîhê ku rengê sipî dikir heft reng, hatibû avakirin. Tereblîn, xwe ji bedêla tijtekî ku rê bide bêtir, wek bekçiyekê

didît. Li hêza ku rengên gulan divejandin û diyarî wan dikirin, xwedî derdiket. Bi baweriya ku ji birêvebirina desthilatekê berpirsyar bû, serê xwe bi tijt û sedemên ku ne karê wê bûn diêjand. Tereblîn, li gor ên ku di bin barekî de diperçiqîn, serbbcwe dihat hisabkirin. Karên wê jî ne pirr bûn. Lê girîng bûn.

Xwe li serê darên ku bi derengî mezin dibûn û ava ku di bin re diherikî, mezin dikir. Ji jînbûna gerdûnê hez dikir. Ji ber ku dûrî hebûna wê bû. Lê gava dor dihat rengê qahweyî, bi awayekî xerab jê aciz dibû. Hema ku rengê qahweyî didît, tu xwe jî jê re nediman.

BI KURTÎ: Rêbaziya pirê, li gor helwestên mirovane bûn.

Gelo hebûna Tereblîn ji tijtekî bê rêbazî pê ve çî bû.

Rêzbariya darikên ku di qutiya derbikan de bi rêzê hatine danîn, wek bejjîneke nexwej dida rûyê min. Dawiya çî gava ku

109

min diavêt hebû. Min ramanên xwe jî asêbûyî didîtin. Bi qasî ku min wilo dixwest jî, destên min bi tu awan pênuş nedigirtin û nediçûn ser kaxetê. Rewja gava masiyekî biçûk ê di hundurê merkaneyekê de gava ku xwe bi hêvî li camê dbce û devê xwe vedike, ji bîra min nediçû. Rivînên kovana azadiyê çar aliyên bedena min girtibûn. Pîvan biçûk bûbûn, tu maneya nexjeyan nemabû û çar wextên salê hew gava ku li wechê wan dihat nerîn xuya dibûn. Min dixwest heta ku ez di nav xwîn û xwêdanê de bimînim, di bin germa dejtê re baz bidim, ez genim û axa bi berke di nav destên xwe de biciqînim, ya jî ber esirekê di bin xunava ku dibariya de bi rê de jil bibim û xwe di nav wan bûyerên azadiyê yên dilgej de wenda bibim. Birina qedê û pêjeroja ji van tijtan bêpar a deverên ne diyar, tirsê di bin jewqa hêzeke

ne diyar de çûna devereke kifj, bêzariyên min li min girantir dikirin. Baweriyên Kant, pel bi pel di bîra min de bûn. Tijtê ku meyvayên vê hêzê diafirandin, hêzeke extiyar bû. Di rojên min ên teng de, divabû alîkariyên J. Paul Sartre bi min bibûna. Ma La-Nausê'e ji zû ve ev soz nedabû min. Gava bêhêvîtiyê, ên xerab, ên xemsar digirtin ber xwe û li sûkan derdbcistin dîtînê, min bi xwe ji zû ve bawer dikir ku ez li ser navê mirovên baj çûbûm dinya têkçûyî a nivîskarê modern ê ku gotibû "em mirov wek hespên sîrkan li dora ramanên xwe difitilin." Ez xelet bûm. Erê xwediyên her tijtan bûn lê di nav êjên jînê de digevizîn. Xuya ye ku bawijkandina wan mirovên serberdayî ya ji ber bêzariyên mirovane, ne ji ber bikêrnehetinên mezin tenê bû. îcar ji bo min bi xwe ji hêla fikrên derên dûr ve li hipodrûma bajarê Caen bi dû hespên rengîn ku bi çargavê dibezîyan ve bû. Edî bîranînên gava ez ku diçûm unîversîteyê min zincîra duçerxê xwe suwar dikir, ew kenê Marie ya restaurantvan ê mê, papazê ku Incîl di destan de bû û wek ku dbcwîne dikir, ji bo min girîngtir dibin. Ez kesê ku di nava çar dîwaran de asê mame, dikevîm dû bîranînên xwe. Em di rêyeke asphalt de dibezîyan. Raptiya ku nexjeya min bi dîwer ve asê kiribû, xurtûma ku av dipijiqand rivînên agirê xaniyê dehqatî, li nigên min diherbilîn.

no

Ez li ba peykerê ku lastîkeke duçerxan kiribûn stûyê wî ketim. Li cîhekî jilopilo, kenê lempeyên neon bêvila min dijikandin. Li buro. Rojeke temmûza germ a anadolûya navîn, esireke bi toz, girgira tirimpêlên textînê û hecîrejkên rej ku wek gullan ji ezmanê jîn dadikevin, buro. Deriyê ku bi boyaxa zeytînê hatibû boyaxkirin, bi tijtekî nîvpembo û bi têtên bi dirrî hatibû girêdan

û ku vedibû ba qulika kanalîzasyonê jî derî bû. Zengilekî bi zir zir. Qumçoka wî sipî bû. Du kîlo ispanak, qernebazar jî teze bû. Selikeke zer, çar dîwan. Nîv kîlo derziyên firkete. Kaxetên ambalajên qetiyayî û sê kursî û behol. Bêhijiya min ku ez dikim ji bîra bikim. Hesara (kês) ku hepijandibûn kîsikan. Rêzeke morîk, çend nalên hespan, Rejat, Hikmet, çend mêjên ku difiryan, dîsa pacak û li ser kursiyê ku li dora xwe difitilî ez bi xwe. Keviya masê a çepê cam e. Salnameyek li ser hebû. Elî, ökkej, Osman... Di valahiyê de girtina bîstikan.

Sentrîfug bi zorê digeriya. Me pêjî jikil û bi dû re jî reng wenda kirin. Der û doreke sipî. Me hew bi tenê gotin dibihîstin.  
-Ma devançe hat girtin?

Di desthilata Vovîl de, devançe hemû li ristan in. Tazîbûna alamanî, dabû dû qajîjên febrîqan ên volan û dizîvirî.  
Ha ha... xenzîr ha.

Qesabê berazan.

Palyaçoyê kampa mirinê.

Darikê destê serokê orkestrayê.

Xwe biqevêz.

Ji bo hemû tijtên heyî mirin. Ji bo hemûyan xurandina bi gullan. Tama mirr a tunebûnê. Xemsariya wek kenê ku bi operloran ji hev zêde dibû. Ne xwe wilo ha?

Mankênê zilam ê ku bi kayê hatibû nepbcandin, keniya. Qirçîn bi jora qulên malên gêrikan ketin û hejînê dest pê kir.

-Nexwe te tirsandin?

Em li ser xwejiya tirsê a jeveke rej a bêdeng dipeyivin.

Li pijt dixana çixaran e pira Tereblîn a ku me fam nake.

iii

Em hemû kurtebiriyan wenda dikin.

Şifîlê pijta rengê qahweyî kiribû du bej. Pîrekeke pîr, wek rejbûna mêjeke ku sipîbûna xwezayê bilewitîne, diçû ber bi rêyên ku derdiketin ser rêyên mezintir. Şifîlên gundê Botsa ên bi fidonek, ziravên wan rêyan bûn. Û ewran ew pirên biçûk bi cilêtan dibirîn. Pîreka pîr di berbangê de ketibû rê. Pazdeh kîlo alûçe li pijta xwe kiribûn. Bi bennan hijk girêdabûn.

-Ka di bin vî barî keve, tu dê bibînî, sa kurê wî sayî, digot û bi dismala xwe xwêdana xwe zuwa dikir.

Bajar hîna dût bû. Bajar û nig. Mirov û pazdeh kilo alûceyên ku ji xwezayê hatine girtin. Ji birinê re mirov. AJûçe, mirov û bajar.

Gava wênevanekî ku bikaribe mirovekî dilbirehm ya jî tu derdên wî tunebin, bi ser de ku bi jin û zarokên xwe re rast be û gava "ax ev welatê berdayî" bibêje û keserekê bikijîne, bedew bike, di rastiyê de zanîbû ku ew nigên xwas li ser xwezaya ku sturehên bizinan dianîn bîra mirov, bi hesreta hespekî sipî bûn. Gava giha rasta kevirê ku ji dema Romayan mabû, pijta xwe daye û barê xwe berda. Çewal di nava kevir û jinikê de ma. Her sê jî rawestiya bûn.

Berê xwe da rêyên ku pê de diçû. Kemyona Chevrole toz bi dû xwe dixist û ji hêla gund ye dihat.

-Ah ew kûçik; heta do li ber destên me bû. Îro jî mezin bûye û bûye zilam. Çira lê vemiriyo.

Kemyon tije zilam bû. Li pêjiya tozê, bêhna balîna dihat. Gava kemyon li çivan dizîvirî, li kornê dixist.

-Hey lawê Yezîd, çawa li kornê dixist.

Kemyonê li ber kevirê ku nivîs li ser bû, hêdî bû.

-Xaltî ez jahidan dibim dadgehê, ê li ser dîreksyonê got. Porê wî yê rej ê hît xwe pê ve berdabû. Tiliyên wî yên wek çepilên ahtapotan xwe li dîreksyonê gerandibûn. Agir dayê.

-Çawa diçe, lawê Yezîd, bi dû de got.

Çewalê xwe ji ser kevirê bi nivîs hilda. Dîsa dest bi çûnê kir.

Rê ye, sipî ye, kêç e? Heger hin dizanin bila bîn ba min.

112

Rengê qahweyî, ji nav tiliyên lawikekî ku meqes girtibû de ket. Gindirrî û wek qertekê di kuçên qezayekê re ket hundur. Rojêke ji rojên ku tizbiyên karban li ber deriyê dadgehê dihatin firotin bû. Ên ku bi enjeksyonan lewento dipijiqandin ser dest û nigên gundiyan, libergerrînên wan mirovên kedî ku ava gulan bi ser îmamokên tizbiyan werdikirin û fîstanên bersêngan vekirî ên afijên sîneman ên ku li dîwarên kerpîçan xistibûn, bala tu kesan nedikijandin.

Li parka biçûk komên mirovan xuya dibûn. Hin li pêyan bûn. Hin li ber rojê rûniştibûn. Qutiyên çixaran derdbcistin. Li destan digeriyan... Herkê ji xwe re çbcarak dipêça. Qumçên zendikên çepilên ku neditewiyan. Gava destên xwe dirêjî qedehan dikin xuya dikin. Gava ê lîmonatafirojê gerok ditewiya û ji misînkê xwe dadigirt.

Rêxa bergîlên ku cuher bi serê wan ve bûn.

Boqên simbêlên karkerê pakkirina kuçan, ku jewqa xwe berguhertî kiribû serê xwe. Melkesa wî ya qirjikînî.

Otobusan hey li ser hev mêt dikijandin.

Cuherên bê hesab keran her bi darên akasya ve dihejiyan.

Car caran diziriyan.

Qet ne xema Bektaj bû. Hemû tijt didîtin, lê dîsa jî ne xema

wî bû. Serê wî rast bilind bû. Morîk bi simbêlên wî dihatin darvekirin.  
Heta tu bibêjî dirêj bûn.

Gav vejeriya gund, wê bigota. "Candirme hemû bûn yek û li ser kirin. Tajiyê kê ye? Me fam nekir. Çawa li kuçê fitilî û çû, çawa wenda bû. Bi dû de candirme hebûn, candirme... Ewr ê kê ye?"

Kijandineke tizbiyên karban hebû. Şaq jaq... jaq.

Me tijtên ku me nizanîbûn, ji bo me wek rojeke ku mirov nejiyabe bûn. Dirriyên darên ziqqûmê ji bo me bûn.

Şînbûn fireh dibû. Ezmanê jîn ê bi xumam dibejijî. Lê rengê qahweyî tijt binbar didîtin. O spiyên ku ser texkan dbcwarin...

Werger: Siileyman Demir

"3

Zeynelê Kurd ê erebevan

Nexjeya dinyê di bin erebe de. Dolabê rastê Asyayê dihêre.

Rijmên min li ser Fransayê ne. Navê hespê min Godoj e.

Heger pêhnan bide wê Afrîkayê biqulpîne. Cuherê wî tije kaxetên lîstikê ye, pepaz û lawik in. Hewdê avê tije şampanya bi kefik e.

Şûjên vala di kadîna kayê de, li taniyta hevdu rêz rêz in. Kaxetên navên wan ên rengîn, wek pûlên koleksiyonan kadîne dixemilînin.

Lempa îdare li ser îrlandayê diçirise. Ber zikê axo, bi kaxetên rengîn ên çira hatine girtin. Bê mûm e. Ji bedêla kaxetên bi demmûj

ku mêjan digirin ve, zimanê palyaço dirêj bûye. Heger Godoj

serê xwe rabike, wê pozê wî li maskeyên ku bi jerîtên rej û sipî

hatine neqijandin bikeve. Heger bipijke, wê stêrik ji ezmên biwejin:

ên ji kaxetan çêkirî wê dakevin û ser Avûstûralyayê bigirin.

Wê li nêzîkî Zellanda Nû bahoz rabe. Wê çar pênc kesên Norveçî

bi qeyikê, Derya Ummanê derbas bikin. Wê radio bibêjin, rojname

binivîsin. Lê li nivê rê Mestan rûnijtiye. Di binya Hindistanê re ye. Rêya Antartîkayê, bi teriya xwe digire. Ne rê dide kelekvanan û ne jî dide bê.

Mihesa min di destê min de ye û ez Godoj li Anadoluyê mihes dikin. Nexjeya ku ez dihêrim, axa ku ez pê lê dikim, Botan e. Navê min Zeynelê erebevan ye.

-Ha Godoj ha... ha...

-Şjjelp

Ma gelo wê hesp bi ku de bazbidin? Karin li qorziyê bifitilin û berê xwe bidin rojava. Wê dîwarên kerpîçan, dîk û mirîjkên ku li ber rojê mexel ketine, li paj xwe bihêlin. Rijm berê wan bidin daristanên jîn. Zeynel, bibe erebevanê mîrên li nêçîrê. Wê erebe bi zêr neqijandî bûya, wê jeş cot hesp di ber erebê de bûna

114

Zeynel axurê hespên xwe biriye Parîsê, li Meydana Saint Michel e. Ereba wî ji Luxsembûrg ber bi jêr ve dadikeve.

Zarokên dibistana pêjî, pîrên dest bi tejî, jina wî, delala wî, muxtarê taxê di ereba wî de ne... polîsên trafikê erebe hemû rawestandine.

Zeynel erebê di kêjik re bi çargavê diajo. Ên ku diçin û tên lê dinerin...

-Ha Godoj ha... ha...

Penêrê bi pincar di kîsê Zeynel de ye. Mastê qahfikan û nanê tenûrê heye. Çar pênc pîvaz jî hene. Wextê ku birçî bibe, erebê dikijînê ber siyekê. Li meydana mezin desmalekê radixe. Wê di bin desmalê de hawûzên mezin, avên mezin ku diherikin hebin. Wê lempên sor û jîn pê bikevin û vemirin. Wê cuherên kayê



ser otobusên bajêr bigirin. Tirimpêlên xusûsî, mêjên ku li mastê wî yê di qahfikan de danîne, digerin. Apartmanên bilind, çortan in.

Reklamên fîlmên kowboyan bi textekî di ereba Zeynel de vekirî ne. Zarokê sunetkiriî di navê de ye. Li cîhê mijteriyar, zilamê defê, li defê dixê û ê zirnevan jî li zirnê dixê.

Bi ser medeniyeta biroqonî de, ava çemên Firat û Dicle diherikin. Bi çemê Seint re dibin yek. Alûcên çiyayên Torosan, ên Cûdî û Nemrûd... Sêvaxink, catir, ser jekokan û tratwaran digirin. Keriyên mîhan û erebeyên kagniyar bi dû Zeynel de bûn.

Çemên ku diçirandin li dora apartmanan difitilîn. Patîskayên renga reng, berpalkan û derdorên neqijandi dorhêl dixemilandin. Zarokên xwas bi Zeynel re dibeziyar bi vir û wir de. Firfirok û jepiyên wan ên ji paçan di destên wan de bûn. Hewa germ bû. Dewfirojan dew dirijandin rêyan. Rê û duryan hemû sipî bûbûn.

Çend mehek bûbûn ku Zeynel dbcwest hespên xwe bi çargavê biajo derinan li pijt çiyar. Ne ku hew bajo îstasyon û nexwejxana bajêr tenê; ne kerxane û meyhanên bajêr; ne ji bo ku rojeke yekjemê bikeve nav xêliyên bûkekê û peran derbbce. Ku ereba xwe biajota nav daristanên çaman ên kesk ên raserî deryayên jîn... ev xwestina revê, lê bûbû wek qutikekî berstukteng û stû-

"5  
yê wî digivajî, nedihijî ku bêhna xwe bigire û berde. Mixabin li dinyayeke li ser erebeyeke çar lastîkî bû. Divabû nefsa xwe û astengên ku derdiketin pêjiya xwe, li hev ragire.

Lê di rastiyê de, Zeynel ji çaxê ku eskerî kir pê ve, mecala ku ji nav bajêr derkeve tu deran, nedît. Botan her li cîhê xwe li

bendî bû. Û Zeynel jî, zilamê taxê yê nas, her wek xwe bû. Tu derya jî nedîtin. Bi esehî rengê wê jî nizane. Mala wî li ba a Behcetê Mucellît bû. Deriyê wî jkestî bû. Di nav qeljên textan re hewja wî xuya dikir. Bînnaza jina wî li nava hewjê kinc dijujtin û ava germ dirijand. Her dijujtin. Legana xwe vala dikir hewjê. Ava lewitî li bin dara mijmijê diciviya, dibû kef û peqik, bi dû re jî diçûn. Çira jevê û nalên hespan bi bi dara mijmijê ve daliqandî bûn.

Axoyê ku me nexjeya dinyê lê radixist, li ba vê hewjê ye. Gava du deriyên wî yên mezin vedibin, erebê tê re diçe hundur û derikeve derve.

Dîroka wî axoyî pirr kevn e. Demekê ji deman dikanek bû. Ji kalikê Zeynel mabû. Bi dû re pîrika Zeynel tenûrek xistibû wir û nan li wir dipêjt. Çêlek li wir didotin, mast li wir çêdikir, dikila û rûn jê digirt. Pijtî ku Zeynel dest bi erebevaniyê kir, wir kir axo. Der û dora wî jî bi textên sindoqên jekir bajtir kir. Ser pijta wî bi heriyê seyand. Nema ne baran dirijiya hundur û ne jî ezmên xuya dikir. Cîhê hespan û çêlekan ji hevdu veqetandin. Zeynel dikek jî tê de çêkir. Ji bo ku carê lê rûnê û bêhna xwe veke... Dojekeke kevn jî anî û danî wir. Çirayek danî wir. Di bin cilekî de jî du çewalên kayê hene. Kertonên salnameyên kevn bi dîwaran ve daliqandî ne.

Zeynel ew qase xweji hemû ji bo delala xwe ava kiribû. Dinya xeyalên wî bi delala wî re fireh bû û ava bû. Heger ji destê wî bihata, wê axo bi zêrê safî bineqijanda. Wê nivîneke ji periyên çûkan li navê raxista. Wê cîhê Godoj û Mestan bi textan ji hevdu veqetanda û ber bêhna rêxê bigirta. Bînnaza jina wî jî tijtek di vê derheqê de nizanîbû. Demeke dirêj nizanîbû. Bînnaz dikuliya.

Çi gava ku diçû axo, dengê meja wê ya kulekî diçû Zey-  
116

nel. Çûna wê, kiribû ku Zeynel tevdîraxwe bigire.

Erê Zeynel tevdîra xwe digirt, lê bi rastî ne zilamekî li ber pîreka  
xwe mirî bû. Carnan gava serxwey dibû, heger kêfa wî bihata,  
radibû bi gulîkên wê digirt û ew bêgavî reqsê dikir.

Jinikê, "wey berikek bê li te bikeve zilamo" digot û diket erdê.

Bînnaza reben nikarîbû bi nigê kulek xwe li ber xwar bikira  
bireqisiya. Lê Zeynel nebûna tijtan fam nedikir û nikarîbû bidîta  
ku nabe. Ji ber vê yekê jî rojnan dibû ku pijtî lêxistinê, ew  
derdixist pijt derî. Gava "wextê ziqima wî" dihat û jûjê araqê  
vedikir, tirseke kamax diket nava Bînnazê. Nedixwest li pêj çavên  
cîranan sîlên Zeynel bixwe.

"Ma ez ê çî bikim ji jina ku ne reqise. Godoj ji te çêtir e pîreka  
nalet" gava digot û jûjê wî di destê wî de bû û qirika wî li  
ser hev hildihat. "Bicehim mala dêya xwe. Tu bû bela serê min  
lê. Hirçeleke wek te tune. Dara ku tu destê xwe biavêjyê wê  
hijk bibe hirçelê" jê re digot.

Zeynel, pêjî kulekbûna wê ji xwe re nedikir derd. Lê gava  
xwest ku êdî divê Binnaze bireqise, nav wan xera bû. Jinika reben  
kinc bikirana wek berfê, ji ava fêkî tijtên xwey jî çêbikira,  
feyde nedikir. Lîmon bi ser pincêr dakira û xwê bikira, tijtên  
kesidandî bikirana telaş û danîna ber qedeha araqê wî jî feyde  
nedikir. Bê feyde bû. Qet tu feyde nedikir. Zeynel bêhtend dibû.  
Wextê xwe yê vala hemû li axo bi Godoj û Mestan re derbas  
dikir. Ya jî ber daran tevir dida Li Godoj suwar dibû û li  
nav bajêr digeriya. Carnan berî wî dida nav jûvan, hêla çiyar û  
serê wî berdida. Betilî dihat û diket û westiyayî ji xewê radibû.

Zeynel û Godoj herdu jî, her tim li derveyî jîna hevaltiya Binnazê bûn. Delala wî, yeke ku carê diket dû garanê rêx dida hev bû. Dikir sergîn, zuwa dikirin û difirotin taxê. Zeynel hima her rojê ew didît. Herdu çavên wê yên ku di nav toz û tirabêlkê de dilîstin, wek du tîran li dilê Zeynel ketin û çûn. Rojekê, li ser pijta hespê xwe, bi rê de lê rast hat û tev teneka li ser piyê wê, rê lê teng kir. Teneka wê rijiya. Dostaniya wan, gava ku Zeynel "7

alîkarî pê kir, dest pê kir.

Jinikê bi dû re dev ji danheva sergînan berda. Li gor dilê Zeynel kir. Zeynel dixwest ku kincên spehî li xwe bike. Dixwest ku pê re araqê vexwe. Qundera wê ya kabikbilind hebe. Wek pîrekên bajarî ku carê li ereba xwe suwar dikir, rûjê di dev û lêvên xwe bide. Şerwal biavêje û manto li xwe bike. Wilo dixwest. Wilo xwe jî û wek mirovan. Dixwest wek di fîlmê Şêx Ehmed de, bi hêza destan delala xwe biavêje pijt xwe û berê Godojê xwe bide asoyên fireh. Wilo dixwest.

Jinik bi aqil derket. Wek dilê Zeynel kir û xwe kir yeke li gor dilê wî. Hima ku roj diçû ava, diçû axo û li bendî Zeynel dima. Heger Binnazê biçûya axo û bidîta jî, jê re xêr xeber bû. Tu tirsê wê ji tu kesan tunebû. Tijtek nediket bîra wê. Pijta wê jî Zeynel rast bû û him mîrê malê û him jî ê dilê wê bû. Heger ku bixwesta karîbû li ereba wî suwar bûba. Ji bedêla mijteriyên ve, ew li tenijta wî rûnijta û bigeriyana.

Çi gava ku diçû axo, bi awayekî ku delalê wê Zeynel bikaribe li ser dîn û har bibe, xwe li ser dojekê radimida û çixarak pê dixist. Li rûja bi qûnika çixara xwe ve dinerî û diramiya. Dengê kulkulandina Binnazê diçûyê. Li hewjê cuherên ku jujtibûn radbcistin,

kincên pînekirî rast hiltanîn û hewj av dida.

Zeynel pirr dilgej bû. Nalên hespan bi morîkên jîn û çavjînkên bi dilê xwe vekiribûn. Herdu hespên xwe yê pirr ji wan hez dikir û delala xwe, wek çavên xwe giranbuhê didîtin. Carê gava ku vedixwar "ji nazdariyan, nazdariya pîrekan û ji bezan jî, beza hespan" digot. Pijtî ku Godoj û Mestan li axo girê didan, li ser sifra ku delala wî raxistibû rûdinişt, destekî xwe diavêt ser stûyê wê û hêdî hêdî xwey dibû. Bi hev re stran digotin. Delala wî radibû, direqisî, li dora xwe difitilî, diçû ser ereba wî, li cîhê mijteriyên rûdinişt, xwe daqûl dikir û dest û mil bilind dikirin. Mêbûna wê ji pêçekê ve bû. Pijtî ku Zeynel serxwey dibû, îcar radibû, destekî xwe dida dîwêr, bi ê din çavên xwe difirkandin û dixwest ku wê bibîne. Gelo diçû pijt ewran, ya jî hew bêrîkirin tenê bû. Ew nedihat zanîn. Asoyên ku qet li wan nabe rej di

118

dilê mirovan de hene. Rohniyeke xurttir li wir dide der û hemû deran digire. Çavên xwe difirkîne û êdî dibîne. Kesayetiya mirov li pijt çiyayekî, ya jî li pijt erebê dimîne. Li ser rêyên kaxetî baz dide, digihijyê, bi destên wê digire û wê tîne cîhê destpêkê. Di nav keft û lefta jewqê de dihêle. Pîrek, bi porê xwe yê berdayî xwediya mêbûna xwe ye. Bi helwesteke bi dil lê derengketî ye. Erebe dbcist navê, ji ber xwestin û halê serxwey, dibû çiyayekî di nabêrê de. Ma îcar wê Zeynel çawa lê biqulipta û bigihijta jewqa gej? Destên xwe diavêtin boqên simbêlan û diçûyê. Xwe diavêt pijt Godoj. Sênga wî mist dida. Jinikê, jîna dirêj hemû dikir nav xwe û wî. Zeynel di ser jîne re ber bi wê ve diçû. Gava nêzîkayî lê dikir, îcar xwe berdida nav dest û milên wî, xwe diavêt himbêza wî.

Qet ji bîra nedikirin ku paca axo a biçûk bi belîfekê bigirin.  
Sûretê Fatma Sultan bi tayên rengîn li ser balîfê hatibû neqijandin.

Çavê wê yê ku li ser balîfê belawela dibûn, bi hewlî li Binnazê  
dinerîn. Sultan kor û Binnaz jî kulek.

Binnazê, li wî bajarê biçûk, her tijt mezin û bi saw didîtin. Çi  
gava ku rûyê xwe bi desmala xwe dinixwumand, wek ku di nav  
tevlîheviyeke mezin de bû, bi keder li jîna xwe dinerî, dest di  
ber bêhêvitiya xwe re berdidan û jîna xwe ya xemgîn û çilmisî  
wilo didomand. Ji navê wê kifj bû, Binnaz. Navê wê li ser zimanê  
taxê tevî bû. Zarokan, li ser kaniyê, li ber çem, gava ku  
kejtîyên xwe yên ji kaxetan berdidan nav avê, bi heter jê dipirsîn:  
Xaltîka Binnaz çima nigê te kulek e?

-Keçê Binnazê ma qey Zeynel nigê te jkand?

"Bila çavên Zeynel kor bibin" digot. "Wey rebî li pijt çiyar  
bimîne û gur û teyrwî bbcwin".

-Ma teyr gojtê miriyan dbcwin?

Binnazê radihijt cêrê xwe û "bicahimin pîçno" digot û bi dû  
wan diket.

A rast ku Binnazê ji dil ji Zeynel hez dikir.

Xelkê taxê, dan û stendinên Zeynel ên bi dizî zû bihîstin û  
"9

wilo zû dest bi pajgotiniyê kirin. Gava pîrek li ber deriyan li  
hevdu diciviyar û tejî dirêstin, dûrik ji bo bextrejiya Binnazê  
digotin. Lawekî wê yê ku çûye eskeriyê tuneye ku rojekê bê û bi  
destê wê kahbika bi qundere bigire û wê biavêje derve!

Mêrên taxê jî dest bi çîrokan kiribûn. Êvaran, gava bi hingulîsk  
dilîstin û pîjmaniye dbcwarin, her bahsa Zeynel dikirin.

Behcetê Mucellît Efendî, ji bo Zeynel, "ew, zîlamê ku mirov du

erebe tije dar lê bijikîne ye" digot. Pijî wî îcar mellê camiyê ser gotina wî tamam dikir: "Ev vaye çend meh çêbûne ku nema limêj jî dike. Ji ber gunehê kebîr rûyê wî rej bûye, dilê wî mohrkirî ye. Xwedê wî bixe ber rahma xwe". Yanî wî jî li gor xwe bahsa qencî û neqenciye dikir. Lê heger li xwe binerîya, wê çî qusûr di xwe de bidîtina... kemyonek hebûn.

Ma gelo dilê taxê bi Binnazê dijewtî û wê rojekê darên senidandinê diyarî wê bikirana? Gelo hinên ku ji dil li ber Binnazê diketin hebûn? Ew qet ne kifj bû. Tapovane taxê Şaban jî araq vedixwar. Lê tu kesan tu tijtek ji wî re nedigotin. Ew mamûrê dewletê bû. Forsa wî hebû. Gava derdiker ser malan li ser dojekê, li cîhê herî xwej rûdinijt. Demekê nedipeyivî, bi tizbiya xwe dilîst. Bal dikijand ser xwe. Libên karbanê zer, yek yek dudu dudu ji tayê naylon bi jirqînê dijemitîn ser hev. Diranên wî taxim bûn. Çi gava ku diçû mêvandariyên wilo, pijî xwarinê derdixistin û di legana destlimêjê de dijujtin. Zarokan bi baldarî lê dinerîn. Bi çavên beloq diman heta ku katib efendî dîsa wan têxe devê xwe û bike jerq jerq.

Otorîta mêrik hebû, lê dihat guhdarkirin.

Tijtekî ku xelkê taxê li ser bipeyiviya tunebû. Ma wê diz di mala kê ketina û li ser bipeyivîna. Wê esamiyê miriyan bihata revandin. Ma wê di derheqa çandiniyê de bipeyivîna. Na, Zeynel heye. Bila ew bê û bibe mijara gotinê. Simbêlên xwe yên mezin babide û were. Ma tu li nexwejxana bajêr î? Ma gelo du serxwej di ereba te de ne? Ma gelo berê te li kerxana bajêr e? Ma gelo tu dê rêwiyan bigihîni ser trêne? Gelo qamçiyê te bi rêjîk e?

120

Ma gelo diket bîra kê? Heger vê demê tu mîr jî bî, ne xema tu kesan e. Divê tu qeresiyên daran bî, ji bo ku te bixwin, kerpîç bî ji bo ku dîwaran bi te lêbikin. Lê wekî din bala xelkê ne li te ye. Xelk karin te bi du hespên te ve girê bidin û hûr bikin. Karin benzînê berdin ser ereba te û êgir pê bbcin. Li gor tijtên ku di civatên jevan de tê peyivîn, karin bennekî têxin stûyê te û te daliqînin. Wê li wê meydana bajêr bikin ku solên te ji nigên te biwejin. Bayê sibehê xemgîn bibe. Godoj bêxwedî bimîne. Cellat dilgeş be.

A rast ku xelkê taxê ji Zeynel ditirsiyan. "Zir kamayek di ber de heye, nê ê ku mirov bikaribe pê re pevçûnan bike ye" digotin. "Xwedê me hemûyan ji xezeba wî bisitirîne. Em hin jîretan lê bikin û bibêjin ku namûs li vê taxê heye. Xwe li jina xwe ragire û vê axa pak nelewitîne. Rojê pîrekekê ji kerxanê neyne mala xwe. Ma tu dê bi vê gunehkariyê bigihijî ku. Bi wê kêra di ber xwe de nê hûr bik û bi perên di bêrîkên xwe de jî, ji bedêla arqê ve, lazimiyên mala xwe bikire. Hinekî sernerm be camêr... baca dewletê bide. Çaxê limêja sibehê, li camiyê be. Ji bo ku em bikaribin bizanibin ku tu jî zilamek î û em te jî bigirin nav civatên xwe yê êvaran. Ji bo ku em rojên cejnan bikaribin hemû bi hev re bî serdana te."

-Ev tijt hemû vign û vala ne, katib Mistefa tizbiya xwe bi jerqîn dikijand digot.

Hemû ving û vala ne. Ma gelo Zeynel ê ku van gotinan fam bike ye?

-Lê, nexwe ma em çawa bikin, muxtarê taxê got.

-A herî baj ku em herin giliyê wî li qereqolê bikin û rojekê bigirin ser.



Pîrekên ku li oda li tenijîtê li gotinên mêrên xwe guhdarî dikirin xemgîn bûn:

-Heger Zeynel biavêjin hefsê, tade li Binnazê tê, digotin.

-Ma wê jinika reben bi nigê xwe yê kulek li ku kar bike.

-Ji xwe divê rûmeta Binnazê bê parastin, katib got. Ma hûn nabên wê ew ê çi bibêje?

121

Binnaz...

Ma wê Binnazê çawa bibêje ku Zeynel tolazek e? Serê jinikê li hemberî xelkê taxê nizm e. Rojekê gava jina katib gotin biribû ser wir, Binnazê ji serî heta nigan sor bûbû. Devê wê ketibû hev û:

"Eslê tijtekî wilo tune. Zeynel xan, ne mêrê ku li tijtekî heram binere ye. Şajiyeye we heye" gotibû, cêrê xwe hildabû û çûbû.

Zeynel jî tijtên ku taxê ji bo wî pîlan dikirin, zanîbû. Tu kesan ji dil bersiva silava wî nedidan. Hemû kesan berê xwe jê diguhertin.

Anîna baweriya taxê pirr sext e. Heger nîvê jevê jî rabe, hespên xwe bibeziîne û pîrikan bîne ser pîrekên ku dikin bizên jî, êdî feyde nake. Zanîbû ku ji bo serê wî di belê xin, wê tijtekî bikin. Tada wî li tu kesan nedibû, lê dîsa jî qajilên jebejê ku wê biavêtina bin nigên wî, amade bûn. Ya divabû dev ji delala xwe berda, ya jî dev ji xwejiyên ku ji xwe re peyde kiribûn.

Me ji ber wilo nexje li axoyê Zeynel raxistibû. Delala wî li aliyekî razabû. Mihes di nav destên wî de bû û diramiya. Ma wê hespên xwe, delala xwe û jina xwe li ku bihijtina û biçûya ku? Delala wî li dera han razabû. Heger bikarîba bi awayekî dilê wê yê reben razî bikira, rêyek bibîta... Gelo karîbû çi bikira? Gelo

bila ereba xwe bibe û li meydana Seint Michel sabûna deqan bifiroje? Wê delala wî jî pere bistendina Wê Binnazê jî cuherê hespan bidana wan.

Wê kanî û jirînek di ser Zeynel re biherikin. Li rasta milê wî yê rastê, darên mijmijên ku nû vebûbin, hebin. Wê xwîn û xwêdana germa dejtê li ser eniya wî hebin. Wê di sênga wî re, posta Haydarpaja û Kurtalanê derbas bibe. Wê rozêta cejnê li ser berstûka sakoyê wî be. Wê kaxeta terhîsê û a deqandina wî di bêrîka wî de bin. Ev Zeynel e. Mêrê bi aqil rahijiyê bivirê xwe û birreka xwe ya kerpîçan û ketiye rê. Dibe li dera ku dê heryê, dîwaran lêbike, malekê çêbike. Tijtên gava ku li hespê xwe suwar bibe jî, birine. Dibe ku di rêyên sext de li Godoj suwar bibe û xwe biavêje girava Hawaî. Li ser rêya heta wir, li çî

122

bajarê ku heye, wê serokên komeleyên xwedîereban hemû li ser rêya wî li bendî wî bin. Wê baqên gulan bidinê, wê konfetan bi ser dabikin. Wê nepoxên kesk û sor û zer berdin hewayê. Wê bi hezaran, dehhezaran bin. Wê kevokên ajîtiyê sipî bin, wek jîpên avê sipî û pak bin. Wê li dora wî bifirin û herin û bîn. Wê stadyûm tije mirov bin; keç law, zarok û pîr û kal hemû bi hev re yek klamê bibêjin û destên xwe ji Zeynel û delala wî re bihejînin. Wê pelên gulan bi ser wan dabikin. Wê Binnazê bi cêrê xwe, hinekî bi jermokî bibejije û wê li pijt wî be.

Çirayek li axoyê Zeynel hebû. Delala wî razabû. Zeynel diramiya. Li derveyî axo, Anadolu bi xwe diramiya, Binnazê diramiya.

Werger: Siileyman Demir

123

Zilamê di valahiyê de

Tarîbûna jevê a sar daketibû ser banan... Kevokên ku di hêlînên xwe de veketibûn, serê xwe kiribûn bin baskên xwe û mabûn. Pbcêriyeke jkestî, xêzikên dû diavêtin ezmanê kesk ê lewitî û portreya karîkaturîstekî pîr û jibîrabûyî, a ku li ber bê belav dibû diyarî bê fikir. Rewja bajêr a li ba doja serbanan, wilo bû. Pacan, çi girs û çi jî hûr ku bi perdeyên çapan hatibûn nbcumandin û ruhniya xurt a hunduran digirtin, ji jîna ku bi rûpelê salnameyê re ji roja berê diket roja din re digotin "baj e". Der û dor ne pirr aram û bêdeng bû. Şewqa farên tirimpêlan li dîwarên vî alî û wî alî diket. Fîkandina trêneke kevn ku bêtir dibû wek kwîtandinê, tev li kaz kaza sayê birçî dibû.

Pîrejinekê, çû sîtila xwe vala kir ser sergo. Qajilên pirtiqalan di nav tirafê de li ber tava hîvê çirisîn. Gava ku pîrejin ji wir bi dûr ket, çend pisîk çûn wir. îcar wî wextî bi xwe bûyerek bû: zilamê ku bi serê jirîneka hesînî ve daliqandî, tu hêla pisîkan kir. Xwest destê xwe yê ku rej bûbû, biguhere. Bi ewlehî fikir. Nigên wî di valahiyê de dihejiyan. Ji bo ku bikaribe xurttir bibe, nigên xwe li hev xistin. Dera ku jirînek pê ve bû, bi hêza kirinên zilamê atletîk ê di valahiyê de, fikir qirçîn. Wek ku hema li ser jkandinê bû, wek ku wê zilam biketa.

Gava ew qirçîn derdixistin, kevokan serê xwe ji bin baskên xwe derdixistin. Diketin nav erê na ya gelo divê bifirin, ya jî bimînin. Pijî bîstikeke bi xiroj, wek ku tu tijtek nebûbû, serê xwe dîsa dixistin bin baskên xwe. Kûçikê ku li ber sergo veketî diponijî û carnan fikir kaz kaz, ji bo mêrikê ku di valahiyê de bû, nedireya.

Mêrik li qorziya maleke kevn bû. Ji ber ku tu karên wî yên

din tunebûn, çend gavên pêjî yên pîrejina ku gemar vala kiribû hejmartibûn û bala xwe bi pûte dabû ser ku tu deng dernekevin û wilo mabû. Gelo wê çi qasê din bi wir ve daliqandî bima? Wî bi xwe jî ev yek nizanîbû. Li gor ku xuya dikir, ma gelo ji bo tamîrê li wir bû? Liwê dera ku dihejiya, nêzîkî nigên wî, tu mêrdewan li ber dîwêr tune bûn. Werîsekî ku serê wî bi çenqel bû û li bedena wî hatibû girêdan û ew li jor bi betona pixêriyê ve asê kiribû jî tune bû.

Zilamê ku di valahiyê de bû, ji bedêla ku destên xwe yên bi wext re dibetilîn biguhere, dbcwest ku nav milên sakoyê xwe bi jirînekê veke û xwe wilo bigire. Lê bedena wî ya ku bi wext re girantir dibû û nigên wî yên ber bi erdê ve, mecala ku bi kirine ji nifjkê ve bikaribe wê xwestina xwe pêk bîne, nedidayê. Vê yekê, tirsê pêjî kir dilê wî. Tirsê û xirojê girt bedena wî. Lerz û qerimîbûna di bedena wî ya kismê nabêra kabokên wî û bedena wî de, di ser hestiyê pijta wî re çû giha nav milên wî. Bi dû re wek pêlên deryayê gava ku li qeraxan dixin û vedigerin, bi pêj û paj de çû û daket heta nigên wî. Her ku bêtir dihejiya, hêza xwegirtinê a di dest û çengên wî de jî kêmtir dibû.

Pijî van tijtan hemûyan jî, tirsê ketinê û mirinê qet neket dilê mêrik. Belkî ji mirinê, wek ku mirov bikaribe li pêjiya xurtbûna deng bixe, rêyeke xelasbûnê hebû. Lê dîsa jî ê ku bi serê wê jirînekê ve daliqandî bû, zilamekî zinde bû. Bi hêviya ku bikaribe hejandina xwe kêmtir bike, xwest ku bedena xwe li dîwarê malê bixe. Gava ku kulîmeka wî gihijt dîwêr, wek ku nigên wî gihjibin erdê kêfa wî dihat û aramî diket neva wî. Pisîkên ku di binya nigên wî re li xwarinê digeriyan, tijtek di nav gemara ku pîrê avêtibûn de peyde nedikirin.

Pijtî bîstikekê, ji mala ku xwendekar lê diman, ê ku wê rojê karê malê dikir derket û hat ku tijtînan vala bike wir. Carnan pirtikên nanê hijk ji nav gemara ku xwendekaran vala dikir, derdiketin. Wana, wek pîrejinan pirtikên nênedikirin kîsekî û danetanîn ber dîwaran. Ew kirina wan baj bi kêrî kûçik û pisîkan dihat. îcar êdî pisîk li bendî ku sîtila gemarê bê vala kirin

125

bûn.

Zilamê di valahiyê de jî li bende bû. Lê ji bo çî bi sifirna xênî ve her dihejiya û li bendî çî û kê bû, ew nedihat zanîn.

Gava jewqa tirimpêlan didayê, siya sola wî ya ku dida dîwêr û mezin xuya dikir, bi dû re dîsa di tarîtiyê de wenda dibû û diçû. Kûçikê kû dikir kaz kaz, ji jevqa tirimpêlan ne di cefilî. Pirça kûçikê pitik zer diqijilî, lê gava tirimpêl derbas dibûn, disa sist dibû.

Mêrik bi ajbûna kûçikê kêfxwej dibû. Û her wilo bi libendemana pisîkan jî pirrê kêfxwej dibû. Gava di fikirî kû wê pijtî bîstikeke din têr bibin, tê derdbcist ku bedena wî germ dibe û hêza wî ya li hemberî valahiyê xurttir dibe.

Lê vê hisê pirrê dirêj neajot. Bê, dbcana ku ji pbcêriyên malan derdiket, dianî û dixist dev bêvila wî. Bi hêviya ku wê dbcan zû bicehime û here, nefesa xwe hijk girt. Gava ku mecbûr bû dîsa nefesa xwe bigire, rûyê wî sor û çavên wî beloq bûbûn. Wî bi xwe ji nizanîbû bê çava karîbû xwe li ber wê êjê hemûyî bigire. Lê xwe li ber girtibû. Zora wî neçûbû. Ji vê yekê bi xwe re, biserketina li hemberî zeîfiya xwe dihat gotin.

Demek bê deng û bê lebat derbas bû. Kuçe û banê xênî, çend deqîqeyên ku nehatin jiyandin derbas kirin. Xwendekarê ku ji

xwendina dersan westiyabû, bi sîtila xwe xuya bû. Pisîk çend metroyan bi paj de vekijyan û li bendî man. Pijtî ku xwendekêr sîtila xwe vala kii û vejeriya, pêjî kûçikê ku dikir kaz kaz bi zexelî ji cîhê xwe rabû û bê dilê xwe ber bi gemarê ve çû. Pisîkan dan dû.

Zilam di valahiyê de dihejiya Ji bo ku bibîne bê wê heywan tijtekî peyde bikin an na, bi hewildaneke dawî destê xwe guhert. Mereqdar bûbû. Xwestina wî ya famkirinê, kabokên wî sist kiribûn. Ricfa ku girtibû pijta wî, xwe avêt nav milên wî. Lê çi kir û nekir, heywanên ku di binya wî re bûn, di pijt solên xwe de nedidîtin. Wek mirovekî ku negihabe xwestina xwe û ji ber bêhevîtiyê dilê wî bê givajtin lê hatibû. Êjeke hijk girt dora dilê wî. Ji bo ku ji lepên tenêbûnê xelas bibe, çavên xwc girtin.

126

Şewqa stêrikan a çilmisî, nava dilê wî dagirtibûn. Şewqek ji wan wek kometekê (dûvstêtk) bi ser de dirijiya.

Li dereke dûr dengê fîk fîka lokomotîfeke kevn a wek kûtandinê dihat û ji hev dirêj dibû.

Werger: Sûkyman Demir

127

## WEŞANÊN NÛDEMÊ

i- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI Cdadct Alî Bedir-Xan / Gramer (1993)

2- DÊ O DEMARÎ Egîde Xudo / Roman (1995) 112 lûpel

3-KESKESORNûredînZaza/Qrok (i995)58rûpd

4- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKEJINAN Rohat / (1993) 153 rûpd

5- HÊZ O BEDEWTYA PÊNÛSÊ Mehmed Unin / Ceribandin (1993) 203 rûpd

6- MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman (1995) 107 rûpd

- 7- MILKE EVINÊ Rojen Bamas / Şiîr (1995) 81 rûpd
- 8- ZAROKAŞEVÊ Jack London Wergen Mustafe Aydogan / Çîrok (1995) 81 lûpd
- 9- BIYANÎ Albert Camus Werger Fawaz Husên / Rotnan (1995) 108 rûpd
- 10- MÎRZAYÊ BIÇÛK A. de Saint-Exupe'ry Werger. Fawaz Husên / Çîrok (1995) 99 rûpd
- 11- GOTTN Yaşar Kaya / Ceribandin (1996) nj rûpd
- 12- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NO . . . Xdîl Duhokî (1995) 104 rûpd
- 13- ŞEVEN SPÎ Dostoyevskî Wergcr. Firat Cewerî / Roman (1993) 80 rûpd
- 14- MIŞK O MIROV John Steinbeck Wergen Firat Ceweî / Roman (1993) 126 rûpd
- 15- BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger Firat Cewerî / Piyes (1995) 92 rûpd
- 16- U BENDA GODOT Samud Becken Werger Firat Ceweî / Piyes (1995) 112 rûpd
- 17- GOTINEN NAVDARAN Amadekar Firat Ceweî / Aforîsma (1995) 106 rûpd
- 18- GIRTÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 174 rûpd
- 19- KEVOKA SPÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 60 rûpd
- 20- KULTUR, HUNER O EDEBIYAT F. Cewerî / Gotar, hevpeyvîn (1996) 413 rûpd
- 21- XEZAL Sîma Semend / Çîrok (1996) 71 rûpd
- 22- EVÎNA REBEN Derwês M. Ferho / Şiîr (1996) 80 rûpd
- 23- BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiîr (1996) 95 rûpd
- 24- KULTURO RAMAN Şeidxan Cizîrî / Ceribandin (1996) 150 rûpd
- 25- KURÊ ZTNARÊ SERBILTND Sidqî Hirorî / Roman (1996) 156 rûpd
- 26- ŞÎRÊN BIJARTE Mayakovskî Werger Siileyman Demir Şiîr (1996) 132 rûpd
- 27- PÊLENBÊRÎ KIRINÊ Musta6Aydogan (1997) 171 rûpd

28- ŞEREF AWENDABUYÎ YA KATHARINA BLUM

Heinrich Böll Wergen Şahîne Bekirê Soreklî / Roman (1997) 139 rûpd  
jo HINGÊ Rojen Bamas / Çîrok (1997) 83 rûpd

31- KEÇA KURD ZENGÊ Cemşid Bender / Çîrok (1997)

32- PÊSMERGE Rehîmê Qazî / Roman (1997), 120 rûpd

33- SORÊ GULÊ Siileyman Demir / Roman (1997), 224 rûpd

Cemşid Bender mîna zarokekî surgunê di  
sala 1921an de li Konyayê hatiye dinyayê.

Wî di sala 1950'î de li Srenbolê fakulteya huqûqê  
xelas kiriye û di navbera salên 1953-58'ande  
li Fransayê doktoraya huqûqê kiriye. Herweha  
ew bi salên dirêj li Norvecê jî maye û li unîversîteya  
Osloyê îhûsasa kooperaûfê kiriye.

Digel ku Cemşid Bender bi kurdî nizane jî,  
wî hera niha li ser dîroka kurdan gelek pinOk  
nivîsandine. Hinek ji pinOkên wî yê navdar  
ev in; "Dîrok û Medeniyera Kurdan", "Dî Medeniyera  
Kurdan de Elewî", "Kulrura Kurdan  
ya Mirfaxê û Xwarinên Kurdî" û hwd ...

Herçî di warê edebiyara bedewe de ye, Ji salên  
50'î û vir ve Cemşid Bender gelek berhem  
nivîsandine.

Keça Kt/rd Zengê ku berê jî hîn çîrok Jê di  
kovara Nûdemê de hatibûn weşandin, bi zimanekî  
herikbar nêzîkî pirsgrêkên mirovatîyê dibe  
û dixwaze dengê qêrînên bêdeng bilind bike.

Weşanên NÛDEM

\*\*



## KESKESOR

NUREDIN ZAZA

NUDEM

NUREDIN ZAZA

Keskesor

Kurteçîrok

fijotkh

Weşanên NÛDEM

Weşanên NUDEM: 6

Keskesor

Çapa Yekem : Stockholm 1995

© Weşanên NÛDEM

Pergala berg û rûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Bahram Haco

Wêneya N. Zaza ji kovara Hêvî

ISBN: 91-88592-065

Navnîşan:

Termov. 52. 2 tr.

177 75 Jarfalla-Sweden

TelûFax: 8-58356468

NAVEROK

Nûredîn Zaza û Kurteçîrokên Wî5

Xurşîd17

Derketî19

Gulê22

Keskesor27

Stêrk32

Perîşanî38

Hevîna Perîxanê41

Xatûn An Piling48

Dê An Xûşk53

Şerê Mêşa55

NÛREDÎN ZAZA Û KURTEÇÎROKÊN WI

Dr. Nûredîn Zaza, yê ku di nav koma hevkarên Hawarê de yê herî xort bû, jiyana wî jî mîna ya pir ronakbîrên kurd trajîk; lê bi rûmet, pirhêl, rengîn, bi tecrubeyan tijî û dewlemend derbas bû. Wî ji welêt bêtir dûrî, xerîbî û sirgûnî dît. Hê di deh-yanzdeh saliya xwe de mecbûr dimîne, digel kekê xwe Dr. Nafiz cih û warê xwe terk dike, ji ber zilm û zora tirkan, ji ber taqîbkirin û stemkariya polîsên wan nake der, riya azadî û rizgariya xwe di revê de dibîne. Ew û kekê xwe Dr. Nafiz baz didin û derbasî Sûriyê dibin. Ew pêşî diçin Helebê, paşê jî bi alîkariya hin kurdên nas û welathez li Şamê bi cih dibin.

Nûredînê biçûk û kekê xwe demekê ji hev diqetin. Ji ber ku kekê wî doktor bû û welathezêkî dilşewat bû, ji bo ku ew alîkariya kurdan bike, wan derman û derzî bike; ya girîngtir jî wan ji nezanî, belengazî, perîşanî û bindestiyê rizgar bike, berê xwe dide beriya Cizîrê û li wir di nexweşxaneyekê de wek bijîjk û di nava gel de jî wek mamosteyekî azadiyê dest bi xebatê dike.

Nûredînê Biçûk, lê yê ku niha di dibistana fransizan de xwendiyê û xwe gihandiyê, bûyerên Tirkiyê roj bi roj taqîb dike û dilê wî her ji bo gelê wî lêdixe. Loma, bombebarandina dewleta Tirk ya li ser Dêrsimê tehmûl nake, ji bo protestokirina van kirinên dewleta Tirk, bi hin hevalên xwe re (ku paşê di bin navê Hêvî de komeleyekê ava dikin) li sefaretên hin welatên Ewrûpayê digerin, ji bo piştgiriya gelê kurd û lidijderketina ordiya hov, ji wan alîkariyê

daxwaz dikin.

Nûredîn Zaza li gelek welatan digere. Pêşî Sûrî, paşê Iraq, Lubnan û Siwîsrê... Ew di vê gera xwe de, an jî di vê jiyana xwe ya sirgûnê de gelek tade û neheqiyê dibîne. Ew di zîndanên kûr û tarî de hesreta çirûskek roj dikişîne. Ew jiyana wî sirgûnê, tade û neheqiya ku lê dibe wî hê bêtir li xebatê gurr dike. Ew bi mamosta Cegerxwîn re dibe yek û bi helbestên wî, ku wê demê ji bo kurdên razayî zengilê şiyarkirinê bû, pê xelkê ji xewa nezanî û kirêt şiyar dike; bi Osman Sebrî re, ku ew jî weke wî mecbûr mabû, welatê xwe terk kiribû û li Sûriyê bi cih bûbû, yekemîn car, di sala 1957'an de bingehê Partiya Demokrat a Kurd (P.D.K.) datînin. Berî lidarxistina Partiyê, ew li Ewrûpayê, di sala 1949'an de bi hin hevalên xwe re "Komela Xwendekarên Kurd Li Ewrûpa" ava dikin û berpirsiyariya wê jî hildigire ser milên xwe. Bi avakirina vê komelê re gelek êrîş têne ser Nûredîn Zaza. Ev êrîş ne bi tenê ji welatên dagîrker, herweha ji komunîstên dogmatîk yên welatên dagîrker jî dihatinê. Van celeb komunîstan Nûredîn Zaza bi nasyonalîstî sûcdar dikirin û xwe jî bi înternasyonalîstî didane pêş. Lê, ew înternasyonalîstiya wan, hindik ba jî, dîsan gelê kurd jê destekewtî nedibû û jê bi qasî misqalekî fêde nedidît. Nûredîn Zaza di sirgûnê de her sirgûn dibû, xwe nedida dest, dîlî û bêdengî nedipejirand; her li ber xwe dida, her dixebitî... Wek mînak; li Sûriyê partî danî, li Swîsrê komele ava kir û rojnameya bi navê "Dengê Kurdistan" derxist, li Bêrûdê berpirsariya radyoya kurdî, ku bermaya Mîr Kamiran Bedirxan bû, girt ser milê xwe. Vî ronakbîrê kurd ê bi rûmet, tu carî li ber zilm û zorê, neheqî û pîkolyê serî dananî. Lê mixabin, kansera kambax pençê xwe avête

vî camêrê rûspî, seriblind, zana û têgihîştî û li xerîbiyê serê wî danî. Vê zerara mezin dostên kurdan xemgîn û dijminên wan jî dilşakir.

Dr. Nûredîn Zaza heta bi wefatkirina xwe jî li Swîsrê dima. Ew li wir bi jineke swîsrî re zewicî bû û bavê lawekî bû. Ew li welatê xwe yê sirgûnê doktora xwe li ser "Herikîna Personalist di ramana fîlosofê fransîz Emmanuel Monnier" de dike û ji bilî xebatên xwe yên milîtanî û siyasî jî gelek bend û nivîsên bi kurdî, erebî û fransîzî dinivîsîne û pirtûkeke helbestan bi navê "Şerê Azadt" çap dike. Du pirtûk jî bi fransîzî "Contes et Lê gendes du Kurdistan" û "Ma vie de Kurd" derxistine. Romana Ereb Şemo wergerandiye, destana kurdî "Memê Alan" digel pêşgotineke dirêj û bedew amade kiriye û hê jî gelek tiştên wî yên neçapkirî hene.

Lê, digel hemû tiştan, digel xebatên wî yên siyasî, nivîs, bend û pirtûkên wî jî, dîsan ji bo min tiştên herî balkêş li ba Nûredîn Zaza, çîrokên wî ne. Ew di aliyê nivîsandina çîrokan de xurt, têgihîştî û li gorî dema xwe nûjen bû. Hê di bîst û du saliya xwe de gava çîroka wî ya yekemîn "Xurşîd" di kovara Hawar, hejmar 27, 15 Nîsan 1941'ê de derketibû, ez bawer im dê pir kêfa xwendevanên Hawarê hatibe.

Ev çîroka wî ya ku di bin navê Nûredîn Êsiv de hatiye nivîsandin, di derheqa peyakî bi navê Xurşîd de ye. Xurşîd dewlemendê gund e. Rojekê ji vî dewlemendê gund re lawek çêdibe. Ev camêr ji bo navê lawê xwe diçe mala meleyê gund. Mele peyakî welathez e û navê wî Cemşîd e. Ew vî navê xwe yê şîrîn diyarî lawê Xurşîd jî dike. Xurşîd bi vê yeka han pir dilşa dibe û bi kêfxweşî ji ba melê dide rê û diçe malê.

Piştî şanzdeh salan, ji bo ku lawê Xurşîd, Cemşîd, bi serfirazî dibistana

xwe xelas dike, bavê wî ji bo dayina mewlûdekê dîsan didilşakir.  
diçe

nik melê. Mele dîsan bi rûkenî Xurşîd qebûl dike û ji bo serfirazî  
û zîrekiya lawê wî mewlûdeke kurdî dixwîne.

Piştî heşt salên din, vê carê jî Xurşîd ji bo mehra lawê xwe diçe  
mala Melê. Mele bi kêfxweşî mehra wî jî dibire. Heya berî ku kurê  
Xurşîd, Cemşîd, bi dû destikên keştiya xwe di avê werdibe û difetise,  
Xurşîd wek xortekî bextiyar e. Ew dilşa ye, bi hêvî ye, xurt  
û li ser xwe ye. Lê piştî windakirina kurê xwe, yê ezîzê ber dilê  
xwe, Xurşîdê weke çiyayekî dikeve, kal dibe, rû lê diqermiçe, pişt  
lê ditewe û por û rih lê spî dibin. Ê bi wî awayî diçe ba melê, bi  
stûxwarî wê nûçeya reş digihînê. Meleyê ku hem zane ye û hem jî  
welathez e, Xurşîd teselî dike, ew bi zanebûna xwe û Xurşîd jî bi  
malê xwe bi xortên gund re dixebitin, xwestina Cemşîd tînin cih,  
wan didin xwendin û daweta çil xortên hêja û miletperwer, digel  
ku Xurşîd di sergovendê de ye, çêdikin.

Di hezîrana 1941'ê, di hejmara 29'an de jî bi navê "Derketî"  
adaptationeke Nûredîn Zaza heye. Ev çîroka ku bi bêhnekê tête  
xwendin û weke helbesteke bedew diherike, li ser derketiyan e.  
Derketî; ew kesên ku ji welatên xwe derketine, terka welatê xwe  
kirine, bi çol û çepelan ketine û ji xwe re li dûriyê li starekê geriyan  
e. Mirov di vê kurteçîrokê de dibîne ku dûrî çiqas xweş be jî,  
dîsan mal, yanî welat xweştir e. Xwarin, lixwekirin, vexwarin,  
xweza û stranên welêt bi mirov xweştir û şîrîntir in.

Di eynî hejmarê de, yanî di hejmara 29 ya 10'ê hezîrana 1941'ê  
de çîrokeke wî bi navê "Gulê" heye. Gulê mêrê xwe, yê ku bê dilê  
wê ye dikuje, paşê bi qiralê çiyar, Qoçoyê Pola re derdikeve çiyê.  
Gulê jineke bejinzirav, spehî, şîrîn û mêrxas e. Lê di çavê gundiyan

de jineke qehpik, bênamûs û xerab e. Qoço yê Pola ku gelek xerabî û rêbirrî kiriye, ji bo ku êdî li hemberî dijminê gelê xwe şer 8

bike, di hizûra gundiyan de sond dixwe.

Nûredîn Zaza hatina Qoço wilo salix dide:

"Gundt di mêvanxana Reşo de rûniştibûn û daxiftin. Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê Şadiya di nêzîk de wê biketa axa bav û kalan.

Herkes diponijm û li çarekê digeriyan. Ezman girtt bu, bandevêkê ji reşiya şevê re htn bêtir tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyar, Qoço yê Pola bi beşt mirovên xwe ve kete hundir. Cilên wan şil bûn, av di tivbtgên wan de dihate xwarê. Gunidyan gişan da ber qtran: Poloyê kurd, sergevazê çryayên Kurdistanê, fermo".

Qoço bi çil gundiyan ve li hemberî dijmin kemînê vedigirin û bi hêrs û rik li hemberî dijmin şer dikin. Gulê radihêje xencerekê û demekê winda dibe. Paşê gava di reşayiya şevê de ji hember tê, gundî û Qoço wilo têdigihîjin ku Gulê ew xistine xefka dijmin; loma gundî Qoço hêrs dikin û Qoço jî berê tivinga xwe bi Gulê vedike û bi hêrs berdidiyê.

"Berikê wek qtrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrtşim raxiste erdê".

Lê paşê gava zora dijmin dibin û li gund vedigerin, di malekê de tiştêkî ecêb dibînin.

"Serê zabitê dijmin ji laşê wt hatibu birrtin û xencer bi xunn bû... Di kulma zêbit a guvaşt de gurzek porên Gulê ên zer pêl didan".

Gava qiralê çiyar Qoço yê Pola vê mêrxasî û binamûsbûna Gulê dibîne û bi rastiyê dihese, rohnî di çavan de namîne, radihêje xencerê

û bi bayê bezê derdikeve û nema xuya dike.

Çîroka "Keskesor" jî di derheqa serîhildana Şêx Seîd de ye. Ev çîroka ku bi forma kesê yekemîn hatiye nivîsandin, xuyaye bîranîbike, bîranîneke

Nûredîn Zaza ya zaroktiyê bi xwe ye.

Nûredîn zarok e, diçe dibistana tirkan. Tam di destpêka biharê de ye. Yanî gava êdî zivistan cihê xwe ji biharê re û sarî jî cihê xwe ji germê re dihêle, Nûredîn guhertinekê di mirovan de dibîne, tiştin dibin. "Gelo ev çi ye, çi dibe?" Nûredînê xwendevan ji xwe dipirse. Lê paşê ji çûyin û hatina mezinan, ji tevgera wan, ji rabûn û rûniştina wan, ji peyv û gotinên wan têdigihê ku şerek dike dest pê bike; şerê kurdan, serîhildana wan li hemberî dewleta tirkan. Têkoşerên kurd demekê baş li ber xwe didin, xwe ji ber êrîşên dijmin diparêzin û paşê jî dijmin ji bajarê xwe derdixin.

Zaza vê yeka han wilo salix dide:

"Esker top mitralyozên xwe berdidan û direviyan. Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dikirin, li hev dihatin û çek didan mirovênxwe".

Şerkerên kurd yên ku ji bajêr derketibûn û dabûn ser piştê dijmin, millet bê sebir li bendî vegera wan e. Dû re gava pêjna hatina wan dikin, "Hatin, nêzîk bûn, kurd hatin" dibêjin. Ev yeka han zû di nava bajêr de belav dibe, her kes pê dihesin "Xort û mêr bi çekên xwe ve, hin bi dehol û zirne, hin siwar, hin peya; bi hezaran û bi dengê her bijî kurd! Her bijî Kurdistan! Her bijî serbestî!" ve pêrgî şervanên xwe tên.

Xuya ye ev azadî û kêfxweşiya millet zêde dom nake. Dijmin bi hemû hêza xwe ve digere ser wan; kêfxweşî û dilşahiya wan li wan dike dûjeh, wan şerpeze dikin. Yanî wê azadiya ku wan ji bo

kurtedemekê bi dest xwe xistine, bi hovîti ji wan distînin.

"Aîa rengîn, şan û rûmeta me çirandin, avêtin ber lingên xwe, pêlê kirin û li şûna wê ya xwe, ya xwtnxwaran danîn. Ziman û stranên kurdt bend kirm û tirsek dijwar xistin dilê xelkê".

10

Çîroka bi dû vê de jî ya bi navê "Stêrk" e. Stêrk çîrokek evînî ye, ji "Les Etoiles", D'alphose Daudet adaptation e. Ez dikarim bêjim ku ev çîrok yek ji çîrokên bi kurdî ya herî xweş û bedew e ku min xwendiyê û jê hez kiriye. Ev çîroka ku gelekî nêzîkî realîzmê ye, lê di eynî demê de pirr romantîk e, di derheqa şivanekî û keça axê, Mijganê de ye. Di derheqa evîna wan de ye, an jî di derheqa evîna şivên ya nîvplatonîk de ye.

Ew xortê diltenik, dilketiyê Mijganê, li ba bavê wê şivan e. Cihê şivên bi qonaxekê dûrî mala axê ye. Ew di xaniyekî mîna holikekê de dijî û ji panzdeh rojan carekê xwarina wî jê re diçe. Piraniya caran, pîrê, ku ew jî li ba mala axê xizmetkar e, xwarina şivên jê re dibe. Rojekê pîrê ne hazir e û kesekî din ku bikaribe xwarina şivên jê re bibe tune ye, ji ber vê yekê keça axê, Mijganê, digel xwarina şivên ya panzdeh rojan li hespê siwar dibe û berê xwe dide zozên, ba şivên.

"Mijgan bi bejna xwe ya zirav û narîn, bi çaven xwe yê çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran spehîti bi xwe bû. Ciyê we bajar, xaniyên delal û îşê wê govend, reqs û stran bû; lê ne çiya, rêl û qantir bûn."

Gava şivan bi wî awayî çav li Mijganê dikeve şaş dibe, bi çavên xwe bawer nake.

"Mexlûqa çeleng! Çavên min jê nedibûn. Cara pêşî min ew ji pir nêzîk de didît. Niha ew li ber min sekinîbû û tenê ji bona çavênminbû".



Lê ew yeka han ji şivên re ne ewçend hêsan bû. Ya ku ew di xewn û xeyalan de lê difikirî, niha li ba wî, zadê wî yê panzdeh rojan jê re anîbû. Ji ber vê yekê jî ew şaş bûbû. Gava ew pê re dipeyivî jî, dilê wî hildavêt, hişê wî diçû û qirika wî dihate girtin.

11

Ji ber ku baran tê û çem weke lehiyekê radibe, Mijganê nikare li çem bixe, derbasî aliyê din bibe û here malê, loma bi tirs ber bi şivên ve vedigere. Şivan vê mêvana xwe ya ezîz bi dilxweşiyêke bêhempa qebûl dike, ji bo ziwakirina kincên wê jê re agirekî dadide, di wê navê de jî jê re xwarinekê û tasek şîr amade dike. Paşê jî jê re ji pûş û ji postê mihê cihekî razanê çêdike.

Ew yeka ku ji bo şivên bi tenê xewn û xeyal bû, niha rastî bi xwe bû. Loma jî wî "tu caran ezmanek mîna ezmanê wê şevê kûr û stêrk wek yên wê şevê geş nedîtibû " .

Keça axayê wî ye, şeveder maye û xwe spartiyê wî. Şivanê diltenik ji evîna wê pê ve li tu tiştêkî din nafikire. Yanî li gor gotina şivên, "Li tiştêkîxerab nafikire".

Xuyaye di wê holikê de li ser wî pûşî xewa Mijganê direve, ew radibe ser xwe û derdikeve der.

"Deriyê holikê vebû û weke htva çardehşevt keçika delal jê derket".

Di hejmara 35'an a kovara Hawarê de jî çîrokeke Zaza bi navê "Perîşanî" heye. Perîşanî ya li ser xeyalekê hatiye avakirin, wilo dest pê dike:

"Li taxa mahciran, ji oda xwe temaşa baxçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar û avên cemidî tîn btra min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibtnm." Û wilo dom dike, di van xeyalan de kûr diçe, digel xweşî û spehîbûna Kurdistanê, ew zilma leşkeran, stemkariya wan, perîşanî, belengazî,

paşdemayîn û nezaniya kurdan û welatê wan dibîne û di vê rêwîtiya xeyalan de dîsan bi paş de tê Şamê, dikeve oda xwe û li ber pencera xwe xuya dike. Bê hemdê xwe keserekê dikişîne û ji xwe re dibêje:

12

"Nezant...Nezanî...Nezanî..."

Hevîna Perîxanê jî di hejmara 37'an a Hawarê de weşiyaye. Çîroknivîs vê bûyerê ji destpêka sedsala 19'an distîne. Ev evîn ne evîna ku em pê dizanin, ne evîna xortekî ye. Evîna Perîxanê evîna welêt e, evîna gelê wê ye. Evîna bavê Perîxanê jî evîna gel bû, evîna welêt bû. Lê bavê wê yê girs, çeleng, dewlemend û miletperwer di ber vê evîna xwe de şehîd dikeve. Şehîdketina bavê Perîxanê gelekî tesîrê lê dike, dilê wê yê tenik perçe dike. Loma ew dixwîne, xwe digihîne, bi dil û can û bi bawerî dide ser riya bavê xwe. Di demeke kurt de gelek mirov li dor xwe dicivîne û dibe serok û şîretkera wan. Lê mixabin, ew jî mîna bavê xwe ji wê evîna pak re dibe gorî, lê ji aliyê din jî li ser riya hizir û ramana wê kurd cih bi cih rizgar dibin.

"Nûçeyên serdestiya Kurdistanê dihatin. Xelkê hêstirên ştn û şahiyê dirijandin û giyanê Perîxanê di tava ala rengtn de diçirîsî û ji giyanê bavê xwe re dikenî".

Nûredîn Zaza di hemû çîrokên xwe de zimanekî sivik û zelal bi kar aniyê. Ez bawer nakim wê tu xwendevan di xwendina van çîrokan de zehmetiyê bikişîne. Digel sivikbûn û zelalbûna zimên, gava mirov temenê wî û dîroka nivîsandina van çîrokan jî dide ber çavan, mirov dibîne ku Zaza xurt û jêhatî bû. Ger di nivîskariya wî de berdewamî hebûya, ew dikarîbû bibûya nivîskarekî dema me yê bijarte. Lê mixabin, ji ber gelek sedemên nas û nenas,

mîha piraniya endamên ekola Hawarê wî jî berhemîn kêm li dû xwe hiştin. Lê her çawan be, ev kêmerhemên wî jî ji bo rohnîkirina dîroka kultur, siyaset û edebiyata kurdî, şewqek e. Nemaze, wê di dîroka edebiyata kurdî cihekî van çîrokên wî yê taybetî hebe. Em hêvîdar in me ê bi berhevkerin, amadekirin û çapkirina vê

13

pirtûkê li hemberî çiroknivîs û zanayê xwe Nûredîn Zaza berpirsiyariya xwe anîbe cih.

Herweha ez dixwazim çend gotinan li ser awayê amadekirina vê pirtûkê bibêjim. Di eslê xwe de ev tiştên ku ez ê bibêjim, ji bo hemû nivîsên di Hawarê de derbas dibe. Di hin çîrokan de ji berdêla "re" û "de", "ra" û "da" hatiye nivîsandin, di hinan de jî, "re" û "de" derbas dibe. Ji berdêla "ku" ya ku îro tete bikarînin, "ko" derbas dibe, "kiribû" bi "kiri bû" hatiye nivîsandin, "bûbû" bi celebê "bû bû" hatiye nivîsandin. Di şûna "hûn" an jî "hun" a îro de "hon" bi kar aniye. Me jî qet pê nelîst, di Hawarê de bi çî awayî hatibûn nivîsandin, me jî ew bi wî awayî nivîsandin. Herçî ji bo navê pirtûkê ye, me çîroka bi navê "Keskesor" minasib dît. Lê bi tenê, serpêhatiya bi navê "Şerê Mêşan" ku di sala 1965'an de di Hêviya Welêt de hatibû weşandin, cûda ye, mîna standarta îro ye. Me ew jî mîna wê nivîsand. Ji bo ku xwendevan bikaribin bi hêsanî çavekî li orjînalê wan bigerînin, me di binê çîrokan de hejmar, meh û sal jî nivîsandine.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...

FiratCewerî

14

XURŞÎD

Xurşîd dewlementirê gund bû. Xortekî bi bejn û bal,

çeleng û giran bû. Rojekê li ber melayê gund rawestiya  
û gotiyê:

- Kurekî min çêbû; jê re navekî şîrîn ji te dixwazim.

Mele hinekî ma, paşê serê xwe rakir û got:

- Bila navê wî Cemşîd be! Wek navê min e û di gund  
de navekî bi tenê ye, ji xwe min jî ev dixwest.

- Here, bi arîkariya Xwedê kurê te ji bo te û ji bo millet  
baş be.

Xurşîd, piştî ku spasên xwe ji melê re pêşkêş kirin,  
derket û dilgeş çû mal.

\*\*\*

Piştî şanzde salan rojekê Xurşîd dîsa çû cem mela,  
15

wek berê xurt û xweşik bû. Mela jê pirsî:

- Dîsan çi ye, mîrza Xurşîd?

Isal kurê min Cemşîd xwendina xwe bir serî û di nav  
hevalên xwe da ê pêşîn derket. Min divê îro jê ra mewlûdekê  
bidim xwendin. Ez hêvî dikim tu îşev xwe biêşî-

\*. 1 AA 1 " \* 1 \* 1 ^ A. ^ A A 1A 1A ni bei mala me u bi denge xwe e şirin  
ve mewlude ji me  
re bixwînî.

- Cemşîd hêja ye, ezê jê ra mewlûdekê bi kurdî bixwînîm.

Heşt salên din borîn. Xurşîd dîsa rojekê bi çend mirovan  
ve li pêş mela rawesta. Mela lê nêrî û got:

- Tu her roj xurtir dibî; di rûyê te de nîşanên xortaniyê  
û jiyinê dixweyin. Ev ji çi ye?

- Bê derd im seyda, çima pîr bibim?

- Min divê tu her we bî. Lê bêje, dîsa çi ye?

- Min ji kurê xwe re keça camêrekî xwestiye, dewlemend e, pir pere xwest. Lê kurê min yek e û li ber dilê min biha ye. Ji kerema xwe mehra wan bibire.

Mela mehir birî û ew pîroz kirin.

\*\*\*

Piştî çend heftan Xurşîd û Cemşîd li ser keştîke piçûk  
16

di golekê da diçûn bajêr, ji bo kirîna cilên bûk û zavê. Ava golê bê pêl bû, di meha gulanê de bû. Doraliyên golê bi kulîlk û hêşinayiyê xemilandî bûn. Xurşîd li kurê xwe dinêrî û xwe bextiyartirê dinê dizanî. Cemşîd wek di xewnekê de bû. Bi zendên xwe ên xurt, destikên keştiyê zû dilivandin û keştî li ser avê dimeşand. Lê carna xwe ji bîr dikir, eqlê wî diçû cihên din.

Ji nişkê ve destikeke keştiyê ket avê. Cemşîd zû vegeirî ser û destê xwe dirêjî wê kir. Di wê gavê da destê wî ê din jî, ji keştiyê şemitî û xwe ne girt, ket avê.

Lê Cemşîd melevanî ne dizanî. Bi carekê di avê da winda bû. Derket û kir hawar. Bavê wî dest avêtê; lê ne gihayê. Cemşîd li ber çavên bavê xwe çû bin avê û nema bi ser ket.

Xurşîd bi çavên xwe bawer ne dibû û li benda derketina kurê xwe dima. Lê ji çend piqqiqokê avê pê ve tişteke xuya ne kir.

Xurşîd sê roj û sê şevan di wî cihê da ma. Roja sisiyan laşê kurê xwe ê nepixî da pišta xwe û bir mal; sibetirê ew veşart.

Piştî salekê bi şev li deriyê melê da. Derî vebû. Melê li

pêş xwe mirovekî dirêj, kal, porsipî û piştixwar dît. Berê ew nas ne kir. Paşê melê kûr nêrî û got:

17

- Ma tu ne Xurşîd î, vê nivê şevê te xêr e?

- Belê ez im, hatime tiştêkî bi navê kurê xwe Cemşîd bidim te, ji bo xwendina zarokên gund ên belengaz.

Xurşîd rabû kîsek pere danî ser masê.

Mela got:

- Ev pere pir in.

- Belê, îro min nivê zeviyên xwe firotin. Cemşîd dixwest bi destê xwe ji milletê xwe ra qencyên mezin bike.

Lê Xwedê ne hişt. Niha ez deynê wî didim.

Melê destê wî girt û bi dengekî nerm gotê:

- Cemşîd kurekî baş bû. Xwedê rehma xwe lê bike.

Lê dinêrim tu pir li ber dikevî ew tişt li min jî qewimî.

Were, emê hejkirina xwe bidin zaroyên gund û ji wan xortên xwenda, xurt û hêja bînin pê.

Xurşîd li ser gotina melê hinekî pêjinî, piştî serê xwe rakir û li melê nêrî. Di çavên wî da ronahiyeke dijwar hebû. Xurşîd dilê xwe da bû zaroyên gund.

\*\*\*

Xurşîd malê xwe, mela zanîna xwe dabûn millet. Piştî şanzde salan di gund da daweta çil xortên hêja, xwenda û milletperwer çêdibû û Xurşîd tê de bi serê sergovendê girti bû.

Hawar, hej. 27, Ntsan 1941

18

DERKETI

Adaptation de "L'exilé" de Lamenneais

Terka welatê xwe da û kete dinyayê. Xwede rêberiya derketiyan bike!

Ez di nav miletan de derbas bûm, li min nêrîn, min li wan nihêrt; lê me hevdû nas ne kirin.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Gava roj diçû ava û ji xircikên newalan dû û dûman radibûn; min ji xwe re digot:

"Çiqas bextiyar e ew mirovê ko êvaran vedigere mala xwe û di nav zar û zêçên xwe de rûdine".

Derketî li her derê bi tenê ye!

Bi kû da diçin ew ewrên ko ba wan dide ber xwe? Ba min jî wek wan dide ber xwe û bê hemdê min, bi kêfa xwe min dajo.

Derketî li her derê bi tenê ye!

19

Ev dar spehî, ev kulîlk xweşik in; lê ev ne dar û kulîlkên welatê min in: Tu tiştî nabêjin min.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Ev çem bi dilekî şikestî li deştê diherike; lê xurîna wî ne wek ya çemê me ye ko min di zarotiya xwe de dibihîst; ev tu tiştî nayine bîra min.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Ev stran şîrîn in; lê ahengên wan ên geş û zîz ne wek yên stranên welatê min in.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Ji min pirsîn; "Çima hergav bi girîn î?" Gava min sebeb gote wan; tu kes bi min re ne girî; ji ber ko derdê

min fehim ne kirin.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Min kalin dîtî; zaro li wan hêwirîne, mîna zeytûnên  
kevnare ko kelem û derxik li wan hatine hev. Lê tiwan  
ne gote min, "kurê min!" tu zarokî ne gote min "bavo!"

Derketî li her derê bi tenê ye!

Min di ser kelat û bircan re alin dîtî; lê ne bi reng,  
ne jî bi pêldana wan, dilê min geş ne bû; ew ne keskesorên  
me bûn.

Derketî li her derê bi tenê ye!

Heval, bav û bira, xweşî, rehetî û serbilindî, bi tenê li  
welêt hene.

Derketî li her derê bi tenê ye!

20

\*\*\*

Derketiyê reben! Ev girîn û zarîn bes in! Pir wek te  
dûr hatine xistin; herkesî wek te windabûna bav, bira û  
hevalên xwe dîtiye. Hêviya xwe vejîne û xwe ragire; tu  
jî rojekê bigehî miraz û armanca xwe, heke îro ne be  
jî... sibe!

Hawar, hej. 29, Hizêran 1941

21

GULÊ

Gundî di mêvanxana Reşo de rûnişti bûn û daxaftin.  
Dijmin ji gund bi tenê qonaxekê dûr bû, nixta gundê  
şadiyan di nêzîk de wê biketa axa bav û kalan.

Herkes diponijî û li çarekê digeriya.

Ezman girtî bû; bandevêkê ji reşiya şevê re hîn bêtir



tirs dida. Di vê gavê de derî bi şidet vebû; qiralê çiyar, Qoçoyê pola, bi heşt mirovên xwe ve ket hundir. Cilên wan şil bûn; av di tivingên wan re dihate xwar. Gundiyan gişan dan ber qîran: "Polayê kurd, sergevazê çiyayên Kurdistanê fermo!"

Lê Qoço rûnenişt, di nîvê odê da ma û wek serdarekî bi dengekî xurt û gur gote wan: "Gundîno! ev panzde sal in ko ez gunehan dikim. Xelkê dikujim. Xerabiyê dikim. Stranên min di van rêlên rojnedîtî de hatin gotin, lê ji dihî vir da ji devê ti kesî dernakevin. Belkî ji bo me hemiyan, ev şev, li ser axa welêt şeva me a dawiyê

22  
be. Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe min sond xwariye ko dijmin ji welêt derêxim".

Sorahiya rivîna agirê êzingan di tifikê de li dîwaran dihejiyan. Pola li dora xwe dinêrî. Çavên wî diçirisîn. Çil gundî tevde rabûn û gotin: " Em jî sond dixwin, em jî bi te re ne, pilingê kurd!"

Di wê gavê de, ji nişkê ve derî vebû, jinikeke zirav, narîn û şîrîn, wek pelekî dara bişengê li ber bayî, ket hundir û got:

"Ez jî bi te re me, ez jî mêrê Pola!"

Gundiyan gişan bi dengekî weke ken kir qîr:

"Gula qehpik! Gula bê namûs!"

Gulê ji gund bû. Berî çend salan bavê wê bi zor ew da bû yekî. Gulê rojekê mêrê xwe kuştî bû, ketî bû pê Qoço û li serê çiyar pê re digeriya. Gundiyan bi çavekî ne baş lê dinêrîn, her gav jê re dijûn dikirin û deriyên

xwe her gav lê digirtin. Ji tirsî Qoço ne bûya belkî ew dikuştin. Lê, ne tehqîra gundiyan, ne jî tajanga Qoço ji Gulê re ev rê ne dida berdan. Gava Qoço ew dida ber tajanga, Gulê digot: "Li min xe pilingê min! Li min xe! heya destê te biweste! Tu jîna min î! Ez goriya te me. Bê te ez nabim!"

Di çîyan de bi Qoço re ger, di şikeftan de raketin, di  
23

berfê de qufulîn, jê re bextiyariyeke mezin bû.  
Wê şevê Gulê dîsa digirî, lê îcar ne ji êşa tajangiya  
Qoço ve ko wek marekî xwe li bejna wê a zirav dipêçand.  
Xew, qet ne diket çavên wê. Dijmin dê biketa  
welêt... Rojên geşî ji bo wan ne diman. Her tişt dibû  
xeyal. Dengê topên dijmin gelek nîzîk dihatin bihîstin...  
Çiyayên Qoço ên serbest diketin destê dijmin...  
Jina gund a pîs li ser vî halî bi girîn difikirîn. Li çara  
xelas bûnê digeriya. Divî bû ko gundê xwe, welatê  
xwe, çiyayê xwe û serbestiya pîingê xwe "Tola" ji  
dijmin biparêze. Ji nişkê ve rabû. Tişteki hati bû bîra  
wê. Xencereke bi şiv girt. Ji şikeftê derket. Riya aliyê  
dijmin girt û wînda bû.

\* \* \*

Qoço, bi çil gundiyan xort û mêrxas ve li pêş dijmin  
kemîn girti bûn. Hingûra şevê bû. Li ser çiyayê bilind,  
nîvresheyveke sor bi dilekî şikestî hêdî, hêdî hildihat.  
Dengê topan hati bû birîn. Pola çavên xwe li ser çiyayên  
xwe; li ser warên xwe gerand û bi keser li wan nêrî:  
Wî sond xwari bû; gunehên xwe yê pazde salan wê

24

bi destê xwe rakirina, ne hişta ko dijmin derbasî tixûbên welêt bibe...

Di dilê wî ê pola de agirê serbestiyê pêketi bû. Wî tu caran wek wê şevê hej kuştin û helanîna tola xwe ne kiri bû.

Demekê, Gulê hat bîra wî. Wî hej vê jinikê dikir. Li dora xwe nêrî; li Gula xwe ya ko wek sihekê jê ne dibû ne dît.

Di wê gavê de nêrevanekî wan got: "Bala xwe bidin! Ji aliyê dijmin yek tê."

Siha ko xweya dikir bê tirs û telaş dihat. Dengekî şikên wan rakirin: "Ev Gula qehpik e!"

Gundiyeke din got: "Qehpikê em xistine xefkê! Tifingê berdê, Pola! Ew rêberiya dijmin dike!"

Qoço rûyê xwe tirs kiri bû; birihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinêrî. Wî jî gotinên gundiyan rast didîtin.

Gulê li cem dijmin çi dikir? Ne xwe cihê wan şanî dijmin kiri bû... qehpitî kiri bû.

Qoço di bin ronahiya heyva sor re tifinga xwe dirêjî Gulê kir û got:

- Ha ji te re, Gulê! Berî dijmin berika pêşîn para te be...

Berikê wek qîrekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrîşim raxiste erdê.

Piştî Qoço rabû ser xwe û ji gundiyan re got:

- Zû bin hevalino! Em ê nixta dijmin bigirin!

25

Çûn. Lê dijmin bê liberxwedan revîn. Kurd ketin asêgehê;  
her der vala bû. Bi tenê di odekê de tişteki ecêb  
dîtin. Serê zabitê dijmin ji laşê wî hati bû birîn û mezel  
bi xwîn bû. Li ser nivînê xencereke bi xwîn diçirisî.  
Qoço xencer rakir; wî ev xencer dabû Gulê? Di kulma  
zêbit a guvaştî de gurzek porên Gulê ên zer pêl dida.  
Qoço kulmikên xwe gez kirin û wî pilingê ko çiya dihejandin  
ji bo cara pêşîn girî û gote gundiyan:

- We bi min gunehê paşîn da kirin, ji Gula qehpik re  
me qehpetî kir!

Bi dengêkî têrêş, têrpoşmanî û têrbirîn gotina xwe a  
paşîn kir:

- Gulê! Te deynê xwe da, te gunehên xwe rakirin! Niho  
dora min e, Gulê! Gula min a zer!

Bi xencera xwîndar wek bayekî ji odê derket, berê  
xwe da dijmin û nema xweya kir.

Hawar, hej. 29, Heztran 1941

26

KESKESOR

{pTHJQÖ\*

Di sala 1925'an de bû. Wê salê, ez hîn nû diçûm dibistanê,  
lê dibistana tirkan.

Di meha Sibate, Sibata dînoka welatê jorîn de, di gelek  
cihan de, berf wek dêliya bûkekê ji rûyê erdê hildihat  
û geşiya hêşinahiyê û kulîlkên biharê bi tevî tazehiya  
wan pêş me dikir. Goya zivistan jî bi hatina tişteki  
hêja hesiya bû û zû xwe da bû paş û şûna sermê, berf û  
bagerê da bû şîrgermiya tava biharê.

Di van rojan de bû ko li bajêr tevliheviyek hebû: Di malan de mezin ji ker ve diştexilîn û bi kêf û bi ken bûn. Jin bi tirs û telaş bûn û bi zarokan re pir mijûl ne dibûn. Esker bi zor diketin xaniyên Kurdan û mitralyoz datanîn serê banan.

Li dibistanê, şagirtên mezin digihan hev û pir tişt digotin:

"Şer... kurd... tirk... standin..." Me piçûk, me dida pey wan û bêî ko bîr bînin bi van nûçeyan kêfx-  
27

weş dibûn. Lehîstik û ders bê rexbet bû bûn. Pirsên:

"Şer... top... kuştin... hatin" em serxweş dikirin.

Mamosteyên ko gişt tirk bûn bê zar xuya dikirin; di dersxanê de gêj dibûn û bê hemd dipeyivîn. Êdî stranên tirkî ne dihatin gotin û ala tirkan ne dihate çikandin ser dibistanê.

Tirs û tevger roj bi roj meztir dibû: Memûr xwe tavêtin mala mezinên kurd û bext ji wan dixwestin.

Esker top û mitralyozên xwe berdidan û direviyan.

Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dikirin li hev dihatin û çek didan mirovên xwe.

Dibistan hati bûn girtin û mamostan xwe veşarti bûn. Zaroyên deh, panzdesalî xencer û şeşderb hildigirtin.

Pirsa "tên" ji her devî derdiket; her kes bê sebir bû:

Rojekê: "Hatin... nêzîk bûn... kurd hatin..." digotin.

Xort û mêr bi çekên xwe ve, bi dehol û zirne hin siwar, hin peya bi hezaran û bi dengên her bijî kurd...

Her bijî Kurdistan... Her bijî serbestî..., ji bajêr derketin

û çûn pêşiya leşkerên kurd yê ko li her derê dida  
pey t... û ji dûr ve tirs dixistin dilê wan. Jin û zaro derketi  
bûn ser banan; hinan stranên şer digot, hinan govend  
digirt. Zaroyan debançe berdidan û hesp dibezandin.  
Her kes ji kêfxweşiyê mest û geş bû bû.

Behsa rojê nû û jîneke geş dikirin. Piştî demekê siwar  
bi kum û destmal, bi şal û şapik wek birûskan ke-  
28

tin bajêr û rast çûn seraya hikûmeta t...

Li serayê tiştê rengîn xuya kir. Wê rojê hinek baran  
hati bû; di pişt re bi derketina rojê keskesor bi ezmanan  
keti bûn. Me got qey yek ji wan danî bû serayê.

Xelk li dora serayê kom dibûn. Em zaro jî çûn. Ew  
tiştê rengîn di ser serê me de sekinî bû. Lê ew ne keskesora  
ezmên bû. Ez bê sebir bûm... li bavê xwe geriyam.

Leşker rêz girti bûn, stranek digotin, çavên wan ên tûj  
têrken bûn. Min ew li ser hespê dît, ez çûm cem; wî ez  
danîm ber xwe. Min jê pirsî:

- Bavo ev çi keskesor e li ser serayê?

- Ev ala me ye; kurê min! Ev şan û şerefa milletê kurd  
e!

- Berê yeke sor hebû, ew çi bû bavo?

- Ew ya neyaran bû. Neyar bi zor keti bûn welatê me.

Em kurd îro wan ji erdê xwe derdixînin û dibin xwediya  
wî. Ha ji te re aleke piçûk! Wê deyne ser dilê xwe!

Hejê wê bike û ji bo serfiraziya wê bixebite!

Ez bi gotinên bavê xwe bû bûm sermest. Dilê min hildavêt.

Bavê min ez maç kirim û ez danîm erdê.

\*\*\*

Heya ko ew keskesor li sera û kelata bajêr pêl dida  
dinê bi me re tim Bihar bû, bihuşteke rastîn. Lê Bihara  
me zû wergeriya. Paîzeke reş û bihušta me bû dojeheke  
29

dijwar.

Piştî çend mehan rewşa bajêr guhêrî. Tirseke mezin  
ket şûna geşî û rehetiyê. Ji bêbextiya kurdan û ji ber ko  
hinekên wan ji nezaniyê arîkariya dijmin kiri bûn,  
kurd dişikestin. Mirovên xwenda behsa bêbextî û bêrûmetiya  
hin kurdan dikirin. Ev hal pir dom ne kir!

Rojekê dijminan dora bajêr girt û bi topan li me xist û  
gotin teslîm bin. Lê herçend, mêrên çekhilgir ne ma bin  
jî; jin, zaro, pîr û nexweş ketin pêşiya dijmin. Hîn xweş  
tête bîra min: wê rojê şerekî no û xwîndar çêbû. Kurdan  
arîkariya dijmin dikir. Gelek ne ajot dijmin weke  
gurên birçî ketin bajêr... Hin di cî de kuştin, zaro û jinên  
avis dan ber sîngiyan, kal bi dar ve kirin. Hinên  
din jî xwe bi zar û zêçên xwe ye avêtin cihên nenas û  
nependî.

Ala rengîn, şan û rûmeta me, çirandin, avêtin ber lingên  
xwe, pê lê kirin û li şûna wê ya xwe, ya xwînxwaran  
danîn. Ziman û stranên kurdî bend kirin û tirseke  
dijwar xistin dilê xelkê.

Ev şanzdeh sal in ko ev hal di Kurdistanê de hikimferma  
ye. Û dîsa şanzdeh sal in ko ala rengîn di dilê  
min û di dilê hezar xortên kurd de pêl dide.

Ji bo anînciha wesiyeta bav û kalan, vekirina tola

30

wan û daçikandina ala xwe ser kelat û çiyayên Kurdistanê  
em kurd li benda Bihara xwe ne; li benda baranekebikeskesor...

Hawar, hej. 30, Ttrmeh 1941

31

STÊRK

Adaptation de "Les Étoiles" D'alphonse Daudet

Gava li zozanên Sîpanê Xelatê min pezê xwe diçêrandin,  
carinan hefteyin diborîn bêî ko ez dengê tu însanan  
bibihîsim. Ez bi tenê bi hevaltiya kûçik û pezê xwe  
bûm. Lê her serê panzde rojan carekê gava ji dûr ve  
min dengê zingilên qantirê me dibihîst ji kêfa xwe serê  
xwe radikir; gundiyek, yan kebaniya mala axê ji min re  
zadê min ê panzderojî tanî.

Wê rojê, ez çiqê dibûm; min ji wan nûçeyên gund  
dixwastin, ji tiştê ko ez ji her tiştî bêtir dilxweş dikirim  
pirskirina halê Mijganê, Mijgana keça axê bû.

Bê ehemiyet min ji wan dipirsî: gelo xanima piçûk pir  
diçe dawet û şahînetan yan ne? Qet dikeve govenda?  
Cilên spehî li xwe dike? Eger ji min re bigotana: "Ma ji  
te re çî? Şivanê reben û belengaz!" Min ê li wan vegeranda  
ko ez gihame bîst salî û min hîn di spehîtiya wê  
de tu kes ne dîne!

32

Rojeke îne ez li benda zadê xwe bûm; berî nîvro baraneke  
xurt hat: heta piştî nîvro çavên min li rê bû. Pişt  
re min hêviya xwe birî û ji sermê ketim holika xwe. Esrê,  
min dengê zengil bihîst; zûka derketim derve; çî bibînim...?



Bizanin kî?... Mijgan! Xanima min bi xwe  
bû...

Li ber holikê peya bû. Ji bayê çiyê hinarîkên wê bûbûn  
sorgul. Li min vejeriya û got; "Gundî mijûl bûn:  
pîrê jî çû bû cem zaroyên xwe bavê min ez şandim..."  
Mijgan, bi bejna xwe a zirav û narîn, bi çavên xwe  
ên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran spehîti bi  
xwe bû. Ciyê wê bajar, xaniyê delal, û îşê wê govend,  
reqş û stran bû, lê ne çiya, zozan, rêl û qantir bû.  
Mehlûqa çeleng! Çavên min jê ne dibûn. Cara pêşî  
min ew ji pir nêzîk didît. Niha ew li ber min sekinî bû  
û bi tenê ji bona çavên min bû.

Dilê min hildavêt, hişê min diçû û qirika min dihat  
girtin.

Mijgan zad ji selikê derxist û da min. Pişt re bi nêrînên  
piçûk li dora xwe nêrî da ko ji giha şil nebe hinek  
fîstanê xwe rakir û çû holika min; min da pey wê. Li  
hundur, li cê raketina min, li bilûr, kulav û darê min  
nêrî, pişt re bi dengê zîz û ahengdar gote min: "Tu li  
vir dijî ne? Şivanê reben! Niha tu bi tena xwe ji diltengiyê  
çiqas bêzar dibî? Bêje min: tu çi dikî? Bi çi mijûl  
dibî û kî tîni bîra xwe? ..."

33

Min ê jê re bigota, "bi tenê te xanima qeşeng". Dilê  
min derew ne dikir; lê zimanê min ne geriya û ez sor  
bûm.

Mijgan bi eza min hesiya û xwest hîn bêtir min biêşîne,  
"hevala te a delal çima carna nayê çiyê û te nabîne?"

Mijganê, gava ew pirs digotin serê xwe dikir paş  
û dikenî; min digot qey periya spehîtiyê bi xwe ye!  
Lê hatina wê weke xewnekê bû. Piştî demekê gote  
min! "Bi xatirê te şivano!"

Bi dilekî şikestî min jî gotê: "Xwedê bi te re be, xanim!"  
Pişt re selikên xwe yên vala avêtin ser qantira  
xwe, lê siwar bû û bi rê ket.

Wisa dihat min ko her kuçê ko ji bin lingên qantir difirin  
yek bi yek li dilê min diketin. Çavên min ji re ne  
dibûn û wek serxweşekî li ciyê xwe dinihêrtin. Êvarê,  
gava pez, vedigeriya gomê min ji kaş dengê bihîst.  
Gava min serê xwe rakir, min xanima xwe dîsa li ber  
xwe dît. Lê niha wek sibehê delalî û çelengî ne dikir, lê  
ji tirsê dilerizî û ji sermê diranên wê dirikrikîn. Welê dixuya  
ko ji barana sibê çem rabûbû, Mijgan xwesti bû  
jê derbas be, avê bor ne da bû. Cilên wê şil bûn û çavên  
wê hêstir dikirin.

Hingûra şevê bû, êdî nikarî bû vegere.

Min xwest dilê wê rehet bikim. Min gotê: "Çi xem e?  
Xanim şevên tîrmehê xurt in, tu sebebên tirsê nîn in,  
çavên xwe bigirî û vekî, sibe ye!" Paşê, zû min agirekî

34

mezin dada. Mijgan sol û cilên xwe ziwa kirin. Pişt re  
min jê re piyanek şîr, hinek penêr, nan û fêkî anîn. Lê  
eqlê wê ne li xwarinê bû, li hal û mala xwe digirî, bê  
hemdê min, çavên min jî hêsir kirin.

Bû şev. Min ji xanima xwe re di holikê de ji pûşan û  
ji postê berxikekî paqij nivînek çêkir. Xanima min çû

nav ciyan û ez li ber derî rûniştim.

Ji hevîna wê, dilê min diperitî û laşê min dişewitî. Lê Xwedê dizane, tu tiştê xerab ne dihat bîra min. Çawan bihata? Keça axê min xwe sparti bû min û li bin parastina min bû! Welê dihat min ko Mijgan di nav keriyê min de û di keriyên dinê gişt de miyeke tekane ye! Min tu caran ezman wek wê şevê kûr, û stêr wek wê şevê geş nedîti bûn. Di canê min de, çavên min de her tişt guherî bûn. Çavên min bi nêrînên şaş li tiştan dinêrîn û aqlê min di ezmanên xeyalan de ajnî dikir.

Di wê gavê de deriyê holikê vebû û wek heyva çardeşevî keçika delal jê derket. Ji mayîna xwe; û ji ber nivînê ji pûş û pelaş xew lê çû bû, hat û li ber agir rûnişt. Min kulavê xwe ji xwe kir û danî ser milê wê, agir vêiand û bêdeng li cem wê rûniştim. ulmnc >-

îfc %: ^r \ ^ i J

Şev xweş û hinek hênîk bû. Di dora me de cîhaneke veşartî bêdeng şiyar dibû.

35

Di her tiştî de ez bi livînekê dihesiyam; giya mezin dibûn, kulîlk vedibûn, mêwe digihan... Dilê wan jî wek yê min hildavêt û xwîna wan jî wek ya min dibezîya... Stêr bi xwe radibûn û rûdiniştin.

Ji tevgera her tiştî û ji her dengî, Mijgan ji tirsan dilerizî û xwe li min dipêçand. Ji nişkê ve di ser serê me re roniyê geş borî. Me serê xwe rakir; stêrekê reşîya şevê çirand û li dûrî me ket erdê.

Mijgan bi tirs pirsî: "Ev çi ye?" min lê vegerand: "Ew

giyanek e, dikeve bihuştê".

Paşê min şhadeta xwe anî. Wê jî, şaş şaş li min nihêrî  
û wek min kir û pirsî: "Hûn şivan sihêrbaz in?" Min  
gotê: "No xanimê! Lê em li serê çiyên nêzîkî stêran in,  
ji lewra em ji xelkê bajaran bêtir bi hal û sirên wan dizanin".

Mijgan serê xwe danî bû ser destekî xwe û li  
stêran dinêrî. Gava min li rûyê wê nêrî, min got qey şivana  
stêran e, ketiye erdê. Bi dengê heyran gote min:  
"Stêr çîqa pir in, çîqa spehî ne!" Min ew tu caran hewqas  
zêf û hewqas çeleng ne dîti bûn! Tu bi navê wan  
dizanî şivano?

Çawan nizamim, xanima min! Binêr! Di ser serê me  
re: komika sêwiyan e, ji rojhelatî hiltê û ber bi rojavayî  
diçe. Hinek li bakur, termê mixêl e heft in li rastê wan,  
dûpişke, hergav li bakur e. Li ber me ye, kakeşîn e. Hinek  
li çep; kerwankuj e; wek stêrka sibehê ye. Ji lewre  
kerwanek pê xapiya ketiye rê, û bi şev ji sermê qufulî  
36

ye. Hinek li nîvro Lêl e; dibêjin ko Lêl û Mejnûn hejî  
hevdû dikirin lê ne digihan hev; gava mirine giyanê  
wan derketine ezmên, yek çûye rojava, yek jî rojhilat.  
Li zivistanê Mejnûn li zozanan e, û Lêl li germiyan e.  
Havînê Lêl tê zozanan û Mejnûn diçe germiyanan û  
gava ji cem hev derbas dibin digihên hev, hevdû maçî  
dikin û pişt re her yek diçe aliyê xwe.

Di vê gavê de tiştê nerm, sivik û germ ket ser milê  
min. Ev serê Mijgan bû. Çîrokên min ew lorandi bûn û  
bê hemdê xwe ew avêti bû xeweke giran. Min qet xwe

ne livand. Stêr pir diçirisîn. Wisan dihat min ko, cot,  
cotê min pêroz dîkin, û bi ken dîsa vedigerin jor. Bi êş û  
keser min li Mijgan dinêrî, lê tu xerabî û pîsîtî ne dihatin  
bîra min. Bi tenê bextiyar bûm. Min digot qey çelengtir,  
spehîtir û xweşiktira stêran dahatiye, xwe daye  
milê min û li wê vezeliyaye.

Heta derketina rojê Mijgan ez sermest hiştim. Pişt re  
rabû, û bi dîtina rojê weke gulekê vebû û kenî. Li goman,  
berx dikalin, li ser zinarên bilind kewan dixwendin,  
li ser xunava giyayên kesk û teze tîrîjên rojeke sor  
diçirisîn, û ji fikra ko ez ê bextiyara xwe winda bikin,  
dilê min ê reben digevizî û bi nalînên kûr û bi keser li  
wan, li pez, kew û çîyan vedigeriya.

Hawar, hej. 33, Çn'rya-pêşin 1941

37

### PERÎŞANÎ

Li taxa Mihaciran, ji oda xwe temaşa bexçeyên Şamê  
dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar  
û avên cemidî tîn bîra min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê,  
li bin daran dibînim. Doralîyên min giş hêşinayî  
ne. Ji bêhnên xweş pozê min vedibe û sînga min hildibe.  
Ji nêzîk, weke nalînê, dengê bilûrekê têt, serê xwe  
radikim: şivanek pezê xwe tîne avê. Çiqas bi kêf im, çiqas  
bextiyar im, bihuşt! Bihuşteke rastîn.

Şivan li bilûra xwe hin bêtir bi keser dixê; laşê min  
giş dilerize, xwe ji bîr dikim.

Gava çavên xwe vedikim, li ber xwe du jendermeyên  
romî dibînim. Çavên wan sor in û ji rûyê wan lanet dibare,

yek ji wan, tivinga xwe ji milê xwe radike, bi dengekî hişk û bi zimanê xwe, ji şivan re dibêje: "Bes bizire, ka ji me re berxekî bîne."

Şivan fehim nake; şaş û bi tirs li wan dinêre. Jendermeyê din dikeve nav pêz û li berxekî qelew digere. Şi-  
38

van razî nabe, lê bi zimanê wan nizane. Bi destê xwe îşaretan dide û dibêje: "Meke! Berde! Berde!" Jendermeyê din tivinga xwe hildide, dirêjî şivan dike: "Bilûr qey ne bes bû, tu bi kurdmancî jî dibêjî" û berdidê. Şivan bêdeng dikeve erdê û pez belav dibin. Xwînxwaran bihuşt kirine dojeheke dijwar.

Bi girîn van deran berdidim û tîm Cizîrê. Wexta paleyiyê ye. Her der zer, zer e. Li zeviyan, ji dûr ve wek heywanan, tiştên bi can, li ser çar lîngan dilivin. Nêzîkî wan dibim, bi qelefeta bedewiyan însanan dibînim, lê bi kurdî dipeyivin; laşê wan ê tazî û spî nerm û xweşik li ber tava Cizîrê şewitî û reş bûye. Pîreka, zaroyên xwe ên berşîr avêtine erdê, nav toz û axê. Mêşan rûyê wan girtiye. Ji cilên wan ên genî bîhnên pîs tî.

Zaroyên deh donzdeh salî alîkariya wan dikin. Nîvtazî ne, pêxwas û serqot in. Ji tavê, çavên wan bi zor vedibin. Bê mekteb û xwendin in!

Li dora xwe dinêrin: darek nîn e. Lê xaniyên wek koxên mirîşkan, dibînim.

Diçim rex wan. Ji derî ve serê xwe xwar dikim, diçim hundur. Alîkî mezeleke tarî, bê pencere û nizim; li quncikekê nexweşek dinale, li aliyekî jî kerek dizire. Bîna

min teng dibe. Zû xwe tavêjim derve. Ev e hal û jiyana wan. Çandina wan çi ye? Çend elb genim û ceh. Bêtirî wan jî cotê axan, an xwedî erdên biyanî dikin. Piraniya wan, ji niha de malê xwe bê qîmet firotiye. Ji ber ko bi-

39  
rçî û tazî ne, belkî jî deyindar in. Ên mayî, li pehîzê, ji destê ticarên bêwijdan, wê çi bikşînin.

Zilma memûr û jenderman jî li ser e. Şêx jî hene: Piştî paleyî û rakirina benderan deynê şêxan dimîne. Roja cejnê ye. Ez van gundiyên reben, belengaz, cahil, bê mirşîdên rastîn û xwedî wijdan, li cem şêxê wan dibînim. Cilên wan peritî ne, hin pêxwas in, û ji dûr hatine.

Tên, ji dûr ve destqifilî, serxwar, li ber şêx disekin, paşê bi dor diçin sejdeya wekîlê Xwedê, wekîlê pêxember û dergevanê bihuştê. Lingên wî, destên wî maçî dikin, tiştêkî didin ê û bi fehît, bi tirs û telaş li ser çongan, pêlepaş dimeşin û derdikevin.

Dinê û bihuşt tev de kar kirine. Niho ew ê herin mal, û çend mehan, di koxikên xwe de, nanê tisî û savar bixwin û ji dinê bêxeber li benda biharê bin. Bextiyar in!

Vedigerim Şamê, ez serê xwe ji pencerê derdixim, ji qesrên delal dengê radyowan û perwaneyên elektrîkî tîn. Li ser cadeyên pak tramway dimeşin. Li ezmên balafirek digere. Bê hemdê xwe keseran dikşînim û ji xwe re dibêjim: nezanî... nezanî... nezanî... perîşanî.

Hawar, hej. 35 Ttrmeh 1941

40

## HEVINA PERIXANE

Rojeke pehîza 1907an bû. Perîxan û Eyşe di bexçê de dileyistin. Perîxan donzde û Eyşe jî sêzde salî bû.

Wek hergav, lîstika wan dîsa şer bû: Perîxan bû bû eskerê kurd û Eyşe jî eskerekî romî. Berê, ji dûr ve bi keviran dan hev; pişt re nêzîk bûn û bi daran, bi sîlan û bi kulmikan ketin hev.

Perîxan di van tiştan de xwe zû ji bîr kir, wek pilingeke birîndar xwe tavêt ser dijminê xwe û pir dom ne dikir ew dida ber xwe.

Eyşe jî xwe li ber Perîxanê pir ranegirt; xwe spart wê û bext jê xwest. Lê Perîxanê dilê xwe zû bi zû hênik ne dikir: di wê de ji navê "romî" û ji romiyan re kîneke venekuştî, kûr û bê payan hebû. Bi darê xwe li kumê Eyşê ê hesin dixist û digotê: "Romiyên genî! hon bi bêbextî me dikujin! heqê me distînin! lê di şerî de dawiya we bi kurdan re ev e! her bijî kurd! her bijî Kurdistan! Qêrîn, zarîn û hêviyên Eyşê Perîxan sist ne dikir.

41

Di vê gavê de, ji aliyê malê merivekî xuya kir. Nêzîk bû; ew apê Perîxanê bû. Bêhal dimeşiya; di çavên wî ên sor de şopên hêstirên ziwa xuya dikirin. Hat, destê Perîxanê girt û bi dengekî têrêş gotê: "Bes e Perîxan! Bes e! te hevala xwe kuşt!" Perîxanê bi erîn û xeyd li Eyşê nêrî û lê vegerand: "Heqê romiyan û yê dostên wan ev e! Bila Eyşe romî nebe! Nizanim emê rojekê tola xwe vekin!... Emê wan ji erdê xwe derêxin!... derêxin!..." Pişt re destê xwe da apê xwe û meşiyar. Piştî demekê



Perîxanê hat ser hişê xwe; serê xwe rakir û li apê xwe nêrî: halê wî ê pêrîşan endîşeyeke mezin xist dilê wê. Çima apê wê bêhal bû?... Çima wek hergav ne dikenî û ne dipeyivî?... Bavê wê ê biha li ber dilê wê hate bîra wê... Perîxanê baş dizanî jîna bavê wê hergav di xeterê de bû. Hezar tişt hatin bîra Perîxanê û telaşeke mezin danê. Dilê wê ê piçûk pir hildavêt û laşê wê ê zirav û narîn dilerizî... Dixwest zû bigehe mal... zû... Ezman reş bû. Bayekî pehîzê î pîs pelên daran ên çilmisî û zer dibarandin ser serê Perîxanê û apê wê. Ev pel wek laşên miriyan diketin erdê û ew dinixumandin. Perîxanê bihintengî dikir... Mal jê re dûr... pir dûr xuya dikir; dimeşîyan... dimeşîyan lê ne digihanê... Dawiyê hatin. Ketin hundir; xelkê malê di lîwanê de bûn û digirîn. Perîxan di nîvê odê de ma û li dora xwe nêrî: ciyê bavê wê vala bû... Ruyê wê bû zer. Bîstekê xwe winda kir; lê zû xwe ragirt û çavên xwe vekirin:

42

diya wê reşa xwe girêda bû; rûniştî, digirî; serê xwe rakir; keça xwe dît, milên xwe jê re vekirin: Perîxan weke çûkekî birîndar kete hemêza diya xwe û bi girîn gotê: "Dayê! Dayê! Kanî bavo? Ka bavê min ê delal? Kuştine! ne?..." ..--^ KURDf ^^

?/" %

\*\*\* Ki^mSç0/

Bavê Perîxanê, Mûsa begê kêsanî, merivekî gir, çeleng, dewlemend û mîletperwerekî hêja bû. Wî ji piçûkayiyê da hejî mîletê xwe ê dîl, hergav bindest lê mêt û

qehreman dikir û ji bo serbest û serbilind bûna wî dixebitî.  
Mûsa beg civateke veşartî digerland. Armanca  
wî ev bû: "Yan serxwebûn yan mirin!" Tu kurên Mûsa  
begî nîn bûn. Bi tenê Perîxana wî hebû. Mûsa beg keça  
xwe wekî kurekî bi xwedî dikir û her tişt hînî wê dikirin.  
Êvaran ew rûdinand ber xwe û bi saetan ve wek hevalekî  
pê re dipeyvî. Carina ew dikir himbêza xwe,  
destê xwe di ser porê wê ê reş de digerland û li çavên  
wê ên kesk û bijangreş dinêrî û digotê: "Perîxanê! ev çi  
çav in, Perîxan? Ev ne wek çavên xelkê ne! Çavên te  
pir kûr, dûr û tûj dinêrin. Ev ji min re pir tiştan dibêjin.  
Ez di van de qedera Kurdistanê, cihanîna hêviyên xwe  
dibînim, min bê guman nekî, Perîxan!" Perîxanê milên  
xwe ên zirav li stoyê bavê xwe digerland, ew maç dikir  
43

û çavên wê hêstir dikirin.

Perîxanê ji niho de bavê xwe hêvîdar dikir: Memozîna  
Ehmedê Xanî ji ber kiri bû. Xerîta Kurdistana mezin,  
tevî bajêr û gundên wê wek resamekî ji ber çêdikir  
û dîwarên odeyên malê bi wan dixemilandin, ji dîroka  
kurdan pir tişt dizanîn û dilgirtiya mêraniya wan dibû.  
Mûsa beg ji keça xwe razî bû. Perîxan wê rojekê bi  
kêrîmiletbihata...

Wê rojê, gava, Perîxan di bexçê de dileyist, bavê wê  
bi hevalên xwe ve civînek danî bû. Bi bêbextiya yekî  
eskerên romî dora çiyê girti bûn û keti bûn hundir. Ew  
yek bi yek derêxistin, birin qışlê û ew dan ber tifingan.  
Gotinê Mûsa beg ên dawîn ew bû bûn: "Her bijî serbestî!

her bijî kurd! her bijî Kurdistan!". Mûsa beg piştî ko ev gotin kiri bûn, keti bû erdê û di xwîna xwe de vegevizîbû...

Diya Perîxanê mesele giş got ê. Perîxan dilgirtiya bavê xwe bû; hinekî girî. Lê gotinên bavê wê hatin bîra wê: "yan serxwebûn! yan mirin! Perîxan! min bê guman nekî!" Belê! Bavê wê di riyeke miqedes de hati bû

44

kuştin; qurbana armanca xwe bû bû. Rabû, çavên xwe ziwa kirin û ji diya xwe re got: "Dayê! bavê min dijwarbûna riya xwe dizanî; wî ev tişt giş da bûn ber çavên xwe. Lê wisa diviya bû. Ez riya wî digirim. Divêt ez tola wî û tola welêt rakim!... rakim!... Ev jî ne bi girî, lê bi xebatê dibe..."

Perîxan ji lîwanê derket û ket kitêbxana bavê xwe. Şeş sal borîn. Perîxanê dibistana xwe xelas kiri bû û bû bû dîlbereke bejinzirav, hinarîksor, narîn û awirpiling. Weke hemî keçên nivşê xwe, Perîxan jî dilketî bû. Lê hevîna Perîxanê ne weke hevîna herkesî hevîneke adî bû. Perîxan dilketiya armanca bavê xwe, dilketiya serbestiya milletê xwe, dilketiya serxwebûna welatê xwe bû.

Perîxan, niho, ji heyeta civata bavê xwe a kevin bû. Bi jîrî, xebat, ixlas û agirê wê, civat li her derên Kurdistanê ji xwe re lebatên hêja peyda kiri bûn. Perîxan bê etlahî dixebitî û xwe ji bo rojeke minasib hazir dikir. Ew roj hat.

Rojeke cejna romiyan bû. Esker li meydana mezin

45

hati bûn rêz kirin. Serdarê esker û hakimê Kurdistanê  
bi zabitên xwe li ciyekî bilind, di bin çadirekî de rûnişti  
bûn û temaşa esker û xelkê dikirin.

Kurd berê vî bi rojekê xwe li her derê Kurdistanê pêk  
anî bûn: Bi tenê ji wan re canbêzarek diviya bû. Ji bo  
wî jî Perîxanê xwe pêşkêş kiri bû.

Dinê bihar bû. Her der bi hêşinayî û bi kulîlkên rengareng  
xemilandî bû. Perîxan, bi cilên hevrîşim spî, bi  
bejna xwe a zirav, bi porên xwe ên reş û çavên xwe ên  
dilbirîn spehîtiya kulîlkên biharê bû.

Perîxanê bi navê bajêr ji hakim re kulîlk pêşkêş bikirana.

Perîxanê kulîlkên xwe danî bûn di nav sepeteke piçûk  
û xemilandî. Li bin kulîlkan bimbêk hati bû veşartin.

Niho Perîxanê sepet di destên xwe de girti bû û weke  
periyekê di nav esker re dimeşiya. Çavên xelkê lê bûn û  
heyran û mest lê dinihêrtin.

Hevalên Perîxanê, şeşderb û bimbe bi dest ve, hêdî...  
hêdî. . . xwe dixistin paşiya esker. Hinekan jî dora qişlê  
digirtin.

Perîxan giha çadirê hakim. Hakim rabû, çû pêşiya

Perîxanê û destê xwe dirêjî selikê kir. Di vê gavê de, Perîxanê  
selik rakir û çiqas jê dihat hewqas bi xurtî ew  
xiste erdê. Di nav toz û dûmanê da her tişt winda  
bûn...

46

Ji aliyên din dengê tifing û bimban dihatin. Lê pir  
dom ne kir.

Romî bê serek ne dikarîn xwe li ber agirên hevalên  
Perîxanê bigirin. Kurd ketin qışlê û ala xwe çikandinê.  
Piştî çend saetan, hevalên Perîxanê ên serdest hatin  
ciyê bimbê. Ji ax û kuç pê ve tu tişt xuya ne dibû. Hinekî  
kolan: laşê Perîxanê di ser yê hêkim re dîtin. Pencên  
wê li stoyên wî kilît bû bûn. Hevalên wê bihin ji  
ber xwe çikandin û sekinîn. Paşê bi hîrmet laşê wê derêxistin  
û ew li ser destên xwe di nav bajêr de gerandin.  
Ji aliyên din nûçeyên serdestiya kurdan dihatin. Xelkê  
hêstirên şîr û şahiyê dirijandin û giyanê Perîxanê di  
tava ala rengîn ne diçirîsî û ji giyanê bavê xwe re dikenî.  
Hawar, hej.37, Kanûna pêsin 1941

47

## XATUNANPILING

Ji Frank Stocken

Di wextekê de padişahê hebû. Fikrên vî padişahî ne  
wek fikrên ên din bûn. Fikirine wî ên ecêb hebûn. Di  
wexta wî de padişahan ji bo şahiya xelkê xwe, di cejin  
û dawetan de peya û dehbe berdidan hev.  
Lê vî padişahî ji vê adetê re tiştêkî nû zêde kiri bû. Di  
van temaşan de ne bi tenê xelkê kêf dikir; lê peyayên  
qenc xelat û ên xerab dihatin ceza kirin. Gava mirovek  
bi xerabiyê dihate îtham kirin ew tavêtin hepsê û piştê  
ew tanîn meydana temaşê. Wexta meydan ji temaşageran  
tijî dibû û padişah li ser textê xwe rûdinişt temaşa  
dest pê dikir.  
Di dawiya meydanê de, li cem hev du deriyên wekhev  
hebûn. Girtî di meydanê re derbas dibû û diçû û

derîk ji wan deriyan vedikir.

48

Eger girtî deriyê sûcan vekira, jê pilingekî birçî derdiket, xwe tavêt ser wî û ew dikir perçe perçe. Hingê xuya dikir, yan padişah welê bawer dikir ko mêrik bi sûc e û bela xwe dîtiye.

Lê ko mêrik deriyê din vedikir, jê xatûneke ciwan û delal derdiket û padişah ew xatûn ji mêrik re mehir dikir û xelkê ji şahiyê ji wan re li çepikan dixist. Mêrik bi jin jî biwa padişah jê re ew jinik jî dida. Ji ber ko bi vekirina vî deriyê mêrik şanî dida ko bê sûc e û zilamekî qenc e.

Li cem qiralan ev isûl pir hêja bû. Ji ber ko bi carekê de peyayên xerab bela xwe û peyayên qenc mikafata xwe digirtin.

Xelkê jî hejî vê tewaşiyê dikir; temaşake bimeraq.

Xelk gava ko dihatin temaşagehê û hetanî ko girtî deriyek vedikir, wan ne dizanî gelo ewê dawetekê an kuştarekê bibînin. Piling carina ji vî deriyê û carina jî ji wî deriyê derdiket.

Keçikeke padişah e delal hebû û li ber dilê wî gelek ezîz bû. Wê keçikê, dizîka, ji peyayên serayê hejî xortekî mêr û çeleng dikir. Lê ji ber ko ew xort ne ji mîrekan

49

bû hejkirina wî sûcekî mezin bû. Ji lewra gava padişah bi evîna wan hesiya ew xortê delal avête hepsê. Li gora isûlê wî ev xort jî wê biçîwa û di temaşagehê deriyek wê vekira. Bi vî awayî wê bihata zanîn hejkirina keça

padişeh lê dibû sûc an ne. Herkesî û padişah jî dizanî ko ev tişt lê sûc e. Lê adet û rêzik diviya bû bihata cî. Ji ber ko sûc mezin bû di welêt de li pilingê xurtir û xatûna çêlengtir geriyan.

Roja hikim hat. Xelk bi tofan diçûn temaşagehê. Cih hemî tijî bû bûn. Herkesî xwe ker kiri bû. Ewçend ko teptepa dilê xelkê wê bihta bihîstin. Işaretek hate dayin û xort kete meydanê. Çiqas bibêjin û rift û zirav, çiqas mêr û spehî dixuya. Li xwe zîvirî û serê xwe li padişê nizim kir. Lê, lê ne nêrî çavên wî diçûn dotmîra ko li cem bavê xwe rûniştî bû.

Dotmîr ne xwesti bû li mal bimîne. Hati bû ko qeder û sernivîsa girtiyê xwe bibîne. Ji roja ko evîna wan bûbû eşkere dotmîrê ji evîna wî pê ve her tişt ji bîr kiri bû, niho wê çi bikira? Tişteki kiri bû ko heta wê wextê ji destê tu kesî derneketi bû. Ewê sira deriyan derêxisti bû. Belê ewê dizanî kîjan derî keçik kîjan derî piling vedişêre.

Dotmîrê ne bi tenê deriyê keçikê lê keçik bi xwe jî nas dikir. Keçika li paş yekî ji her du deriyan veşartî ji  
50

xatûnên qesrê a xweşiktir bû. Dotmîr ew xweş dinasî. Ewê çend caran bi çavên xwe dîti bû ko keçika li paş derî bi çavên evîne li dilgirtiyê wê nêrî bû û carekê du caran jî dotmîrê bawer kiri bû ko dilgirtiyê wê jî li nêrîne wê keçikê vegerandi bû. U dawiyê, rojekê dotmîrê ew dîti bûn ko bi hev re daxaftin. Vê keçikê wêrî bû li dilgirtiyê dotmîrê binêre û pê re baxêve. Ji lewre dotmîr lê hati bû xezebê... xezebeke gur û kûr...

Gava xort serê xwe ji padişah re xwar kir û li dotmîrê nêrî bû; çavên wî jê dipirsîn: kîjan? Xort dotmîr xweş nas dikir, qudreta wê dizanî; bêşik dotmîrê sira deriyan derêxistiye. Ji lewre xort li dotmîrê gelek bi hêvî nêrî. Çavên wî jê pirsî bûn û xort zanî bû ko pirsiyariya wî jê re eşkere bûye. Diviya bû lê vegeêne.

Dotmîrê piçik destê xwe rakir û ew ber bi aliyê rastê bada. Ji dilgirtiyê wê pê ve tu kesî ew ne dît. Ji ber ko her kesî çavê xwe berda bû xort û awirên wan ber bi deriyan diçûn. Xort ne sekinî, bi mêranî û bi gavine lez ber bi deriyan çû. Dilên temaşageran qey sekinî bûn, herkesî bihna xwe girti bû. Xort ber bi deriyê milê rastê ve çû û deriyê rastê vekir.

\*\*\*

vfyrOTHÊO.^

51

Niho, tîjika çîrokê ev e. Gelo ji deriyê ko hate vekirin piling an jinikek derket? Herçend em vê meselê didin eqilê xwe çend cihaba wê çetîntir dibe. Ji ber ko dotmîr pir hejî wî peyayî dikir û bi hêsanî ji yeke din re terka wî ne dida. Carina di xewnên xwe de didît ko dilgirtiyê wê derî vedikir û pilingekî birçî xortê wê didirand. Carinan jî xewinine din dîtin: didît ko derî vedibû û keçikek jê derdiket û bi dîtina keçika ciwan xort şa û dilxweş dibû û xelkê ji wan re çepik li hev dixistin û ji kêfê didan ber qîran. Dîsan dotmîrê dîti bû ko wî xortî ew xatûna çeleng wek jina xwe biri bû mal û qet li evîna wê ne pirsî bû. Ma bi carekê mirin jê re ne çêtir bû?



Bi saetên dirêj ve, bi şev û bi roj dotmîr dama bû.  
Ewê çi bikira? Ewê dizanî ko xort deriyê xêrê jê bipirsiya.  
Dawiyê dotmîr qerara xwe da bû û gava xort jê  
pîrsî bi lez destê xwe rakiri bû û deriyê aliyê rastê şanî  
wî da bû.

Gelo dotmîrê kîjan derî bijarti bû? Ez bi xwe nikarim  
ji vê pîrsiyariyê vegeînîm. Ji lewre ez wê ji we hemiyan  
re dihêlim: Ji derê ko hate vekirin çi derket, piling yan  
xatûn.

Hawar, hej. 44, Gulan 1942

52

DEANXUŞK

Frank Stocken

Li golekê, xortek dê û xûşka xwe di sendalekê de digerîne.  
Dinê bihar e. Bayekî şêrîn li ser rûyê avê ê şîn  
pêlên sivik çêdike û wek dergûşekê sendalê dihejîne. Di  
bin şîrgermiya tavê de kulîlkên doralîyên golê bi giranî  
hildibin. Wek xanimên çeleng û xemilandî bi pozbilindî  
li hev dinêrin û ji xwe pêve tu kesî naecibînin.

Sendal, bi stran û ken û peravan dûr dikeve. Xort li  
dê û xûşka xwe dinêre; ji şa û kêfxweşbûna wan, xwe  
çiqa bextiyar dizane û heşmetkar li diya xwe a pîr, lê  
hîn çeleng û narîn û li xûşka xwe a ciwan, şepal û dîlber  
temaşê dike.

Ji nişka ve, ji livîna yekê ji wan sendel diqulibe û her  
sê jî dikevin avê. Ji xort pêve ne dê û ne jî xûşk bi melevaniyê  
nizanin.

Xort hewar û zarînên wan dibihîse û cigera wî diperi-

53

te. Her diwan pevre nikare xelas bike; ewê yekê ji wan bibijêre: kî gelo? Xûşk an dê?

Ez dikim nakim tu tiştî tê dernaxînim. Ka hon jî pê mijûl bibin û hinekî xwe biêşînin...

Hawar, hej. 44, Gulan 1942

54

### ŞERÊ MÊŞA

Di mala vî camêrî de, piraniya wextê xwe yê panzde rojan, min bi mêşkuştin û bi mêşqewirandinê derbaz kir. Ez derewa nakim gava ez van tiştan dinivîsim. Binêrin çawan: Di rojên pêşin de ez di oda piçûk de, di ya nêzîkî dehlîzê de, radizam. Ev... jî, kurê S... yê navîn, hîngê 17 salî, li wê radiket. Di îşê bîleta de kar dikir.

Lawikekî hûrik, bê laş û gewde û rengnexweş bû.

Lê di karê xwe de sivik, xortekî çav vekirî, mêr û kurdperwer bû. Êvaran, berî ku ez xew ve herim, ewî bi pirsên xwe û bi şev jî bi xirxira xwe ez gêj dikirim. Dinya havîn bû û serê sibê, roj gelek zû hildihat. Berî ku roj derkeve, S... ji bo nimêja sibê radibû û nema dihat, Ev... şiyar dikir ku here ji firnê, nanê taxê yê tenik bikire. Gava Ev... ji xew radibû, derdiket û diçû, ez şiyar dikirim. Bi ser de jî, deriyê ku dikete rojhelat, vekirî di-

55

hişt; bi vî awayî bi tîrêjên rojê ve tabûreke mêşan jî xwe davête hundir. Ji germiya tavê û vingevînga mêşan xew êdî mimkin nedibû. Ez, hîngê, radibûm, mêşkuja ku, ji êvarê de min xistibû bin doşekê, dikire destê xwe

û bi mêşan diketim. Gava min dawiya wan tanî û ode bi laşên wan radixist, saet dibû şeş, şeş û nîv. Hîngê barbar, qîrîn û girîna piçûkên malê dest pê dikir. Hinek diçûn dibistanê û hinekan jî li malê pev diketin. Yê hîn di dergûşê de, zarîna xwe digihandin heya ezmanan. G..., keça S... ya piçûktir, ne bi tenê bi vizvizî, lê bi qirêjiya xwe jî, ji xelkê malê re rahetî nedihîşt. Du salî bû, lê hîn bi xwe nedikarî û di derpiyê xwe de dikir û paşê pê hev jî dikir. Diya wê ya reben, êdî nedizanî hema xwe pê mijûl bike an bi kar û şixulên malê rabe. Carna, piştî guharandina wê bi saetekê, gava dê, li metbaxê xwarina xwe danîbû ser êgir û nedikarî xwe jê dûr bêxe, G... derpiyê xwe ji nû ve dadigirt, paşla xwe bi zor dikişkişand, diçû metbaxê û li dora dê û tencera wê ya li ser "papora" pêxistî ya li erdê digeriya. Diya wê dikir, nedikir, ew ji wê derê bi dûr nedixist. Rojekê, li ber çavên min, li metbaxê, li kêleka beroşa ya li ser êgir, vê keçika ha, bêtirî saetekê dawa diya xwe girtiye, li wê maye û kûziyaye. Edî, we bidîta, mêşên ku lê kom bûbûn, li ser siwar dibûn û laşê wê yê

56

piçûk dinûximandin.

Ji merovekî ku li ciyekî welê hatiye dinê ku ne bi tenê paqijtirê Kurdistanê, lê, yê cîhanê ye; ji bo merivekî ku di piçûkahiya xwe de, li ber destê diyeke welê mezin bûye ku, ji ber paqijiyê, nexweşiyêke dil pê re peyda bûbû; ji merivekî ku di mala birayekî doktor de mezin bûye ku ji bo ku wan hînî paqijiyê bike, li nexweşên

xwe dixist; ji bo merivekî ku bi salan ve li Swîsrê maye,  
ji merivekî ku ji piçûkiya xwe de, berî ku xwarinekê bibe  
devê xwe, mîna kûçika, ew bêhn kiriye, ev dêmen  
(menzere) û ev bêhn ji mirinê diwartir bûn.

Lê, ji tirsê ku ez wan bixeyidînim, min xwe nedikir  
tu tişt nedigote wan. U gava li ser sifrê, xwarin datanîn  
erdê, û G... şuştî û bi cilên guharandî, di hemêza dê an  
bavçe xwe de rûdinişt, bi xelkê malê re, bi hev re, bi  
dilxweşî, min zikê xwe têr dikir.

Lê, berî ku xwarin pêk bê, ez diketim oda navîn, a  
me tê de dixwar, û bi saetan, min xwe bi kuştina mêşa  
mijûl dikir. Carna, min ji wan du, sê heb bi derbekê tanîn  
xwar; hîngê, wek "pêşmergekî" qehreman, min ji  
S... an ji jin û zaroyên wî re digot: "Dilê xwe geş bikin,  
ka ji we re çend Ba'asiyên sekitî!..."

Hîngê, li Şamê bi tenê rojnameyek derdiket, ew jî ya  
Ba'asiyan, Ba'as bi xwe bû. Her roj, piştî nîvro, S...  
hêjmarek ji min re tanî. Tiştên vê rojnamê yê baş ev  
bend bûn ku davêtin Cemal Evdinnasir. Nivîsandinên  
57

wê yê din nedihatî xwendin. Berî ku paldim û dest  
bi xwendina wê bikim, midetekê, ez dîsa bi qîrîna  
"Ba'asiyên" xwe radibûm.

F... keça S... ya mezin, xudiya oda navîn, hez dikir  
ku ez xwûna wan li ser çerşefên textê wê yê spî birijînim.  
Lê min bi ya wê nedikir. Ji lewre, carna ji min aciz  
dibû, ji odê derdiket û diçû, li derve, bi dengê bilind,  
dilmayina xwe ji min re dida gihandin. Lê min guh nedidayê,

ji ber ku, ji min nedihat ku ez wan berdim, ji  
destê min bifilitin.

Bi qelandina wan bi tenê laş, guh û çavên min rahet  
dikir, lê welê dihate min ku, ev mêşên ha, li ber çavên  
min, bi rastî bûne "Ba'asiyên" bi goşt û gewde. Bê  
hemdê min, bi kuştina wan bêhna min derdiket û dilê  
min pê geş dibû. Di vê midetê de, di şerê mêşan de, min  
du mêşkuj şikandin...

P. H. : Di sala 1963, meha gulanê de Ba'asî, piştî ku navê min  
danîn ser "Lîsta reş" hatin ku min bigrin. Ez ji destê wan filitîm û  
berî ku birevim, bêm Libnanê, ez li Şamê du mehan veşartî mam.  
Di vê midetê de, ez bûm mêvanê 5 malên kurdên camêr. "Çîroka  
mêşa" li mala S... derbaz bûye.

Hêviya Welêt, hej. 3, Newroz 1965.

58

Nûredîn Zaza yek ji  
endamê ekola Hawarê  
yê herî xort û herî  
zîrek bû. Bi alîkariya  
kekê xwe Dr. Nafiz ew  
bi salên xwe yê ciwan  
meyla xwe berdide ser  
pirsa kurdan û heta  
dawiya jiyana xwe jî  
didomîne.

Ew hê di zaroktiya  
xwe de sirgûn dibe û  
her li sirgûnê jî wefat

dike.

Nûredîn Zaza di  
jiyana xwe ya sirgûnê  
de çî di warê siyasî de,  
çî jî di warê întelektuelî  
de xebatên hêja  
dike. Lê yek ji xebatên  
wî yê herî hêja  
çîroknivîskariya wî ye.  
Ew li gorî dema xwe  
çîroknivîskarekî bijarte  
bû. Me jî wek  
Weşanên Nûdemê  
berhevkin û çapkirina  
çîrokên vî rewşenbîrê  
kurd ji xwe re  
mîna berpirsiyariyekê  
dît.

\*\*

KEVOKA SPÎ

FIRAT CEWERÎ

çîrok

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)

[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

NEFEL

KEVOKA SPÎ

1

e-poste: [info@nefel.com](mailto:info@nefel.com) malper: [www.nefel.com](http://www.nefel.com)

2

FIRAT CEWERÎ

NEFEL

Stockholm

2002

www.nefel.com

info@nefel.com

3

Firat Cewerî:

Weşanxane: Nefel

Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.

120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com

info@nefel.com

© Firat Cewerî û Nefel

Çapa dijîtal: 2002

ISBN: 91-973195-4-6

Çapa kevin: Nûdem

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyê destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve  
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike

û di Internetê de bêxe malpera xwe.

4

Nêverok .....

..... 7

Dilê şikestî . . . . . 15

Şeva sersalê . . . . . 23

Doktor Sertaç . . . . . 29

Heyştê adarê . . . . . 37

Stêrkek ji ezmanê me xuricî . . . . . 41

Xewna Orhanow . . . . . 43

Kêzika bênav . . . . . 49

5  
6

Ew pênc roj berê ji girtîgehê hatibû berdan. Digel ko emrê wî hê bi tenê sihûpênc bû jî, tayekî reş di porê wî de nemabû. Gepên wî kort bûbûn û qermîçokên rûyê wî bûbûn mîna yên kalan. Ew rûyê wî yê gewr û jîndar niha zer bûbû. Bejna wî ya dirêj ko demekê ji keçikên mehelê re mereq bû ko bidîtana, tewiya bû. Ew êdî ne xortekî berî niha bi panzdeh salan bû, bûbû mîna kalekî.

Erê, ew pênc roj berê hatibû berdan... Û niha, li qatê sisiyan, li ber pencereya odeya xwe ya xebatê rûniştibû û li derve, li barana pêşî ya payizê temaşe dikir. Car caran ji nişkê ve dikeniya, bi pistînî tiştin digotin û dîsa bêdeng dima. Ev yeka han berhema salên wî yên girtîgehê bû. Berî pênc rojan, gava ew ji girtîgehê hatibû berdan, bavê wî û merivên wî yên nêzîk bi vê yeka han hesiyabûn, loma wan ew zû nîşanî doktorekî nas



dabûn, doktor tiştêk jê fêhm nekiribû, bi tenê gotibû: »Divê hûn wî bib-  
in Ankarayê«. Lê ne wî dixwest here Ankarayê, ne jî rewşa malbatê  
ewçend baş bû ko ew bibira Ankarayê. Rojekê jî wan pîrek ji gundekî çiyê  
anîbûn, da ko pîrê hin dermanan jê re çêbike û tiştêkî li ser bixwîne, lê ew  
belkî zêdeyî deh deqîqan bi pîrê keniyabû, paşê xwe avêtibû ser pîrê,  
destên xwe xistibûn qirika wê û ger ne ji endamên malê bûya wî ê li wir  
ew pîr bixeniqanda. Pîra ko bi zorê xwe ji nava lepên wî filitandibû, di  
derî re derketibû û bi xurtbûna xortekî bazdabû.

Barana ko dihat carinan xurt dibû, carinan mirov digot qey wê dawî  
were, kêmbû, lê dîsa bi xurtî dibariya. Wî jî herdu enîşkên xwe  
danîbûn ser masê, serê xwe xistibû nava kefên destên xwe û bêyî ko  
çavên

xwe bikutkutîne li barana pêşî ya payizê dinihêrî. Carinan dixwest  
dilopek baran ji hewa de heta ko bigihîje erdê taqîb bike, lê hew dinihêrî  
ko dilopin din diketin ber wî û bala wî dîsa belav dibû. Ew cerekê jî li  
hebûna baranê fikirî. Wî ew perçeewrên reş yê li ezmên şiband  
deryayeke weke moxilê biqul. Di wê navê de dîsa ew pîrika wê rojê hate  
bîra wî. Ew dîsa mîna wê rojê bi pîrê û bi dengê bilind keniya. Paşê  
bi carekê ve kenê xwe birî. Çavên wî beloq bûbûn. Wî ew çavên xwe yê  
7

beloq bera ewr dabûn. Erê, rast bû, di nav ewrê reş de kevokeke spî xuya  
dikir. Ew her ko nêzîk dibû mezin dibû, her ko mezin dibû  
dişibiya xweha wî. Erê, ew xweha wî bû. Wî bi çavên xwe didît.

Vê carê enîşkên xwe ji masê hilanîn, bi herdu destan xwe hişk bi masê  
girt û ziq li xweha xwe nihêrî. Kirasekî tenik li xweha wî bû, guliyek ji de-  
hfên hespan li eniya xwe girêdabû û li ber pencereya wî difiriya û dixwest  
di pencerê re têkeve hundir. Gava mêrik ev yeka han ferq kir, hema ji ci-  
hê xwe pengizî û pencere vekir. Bi vekirina pencerê re xweha wî firiya

hundir. Digel ko li derve baran xurt dibariya jî dîsa keçik şil nebûbû. Çavên keçikê mîna du morîkên şîr dibiriqîn û lêvên wê yên dagirtî di rengê sorbûna hinarîkên riwê wê de bûn. Bejna wê dirêj, newqa wê zirav û hêtên wê dagirtî bûn. Ew bi wî awayî li quncikeke odê li ser lingan rawestiyabû, baskên xwe bera ber xwe dabûn, stûyê xwe xwar kiribû û bi rewşa birayê xwe digiriya. Wê digot:

— Keko ev çi bi te hatiye? Birayê mino kanî xortaniya te? Te çima xweha xwe kuşt? Çawa destên te li min geriyan û te ez kuştim? Çawa destên te li xweha te, ya ko te ewqasî jê hez dikir, geriya?

Axx... Min çi bêriya te kiriye. Axx... Ez çi dixwazim te hemêz bikim. Ez çi dixwazim birayê xwe tayê bi tenê hemêz bikim. Ez çi dixwazim rohnîka çavên xwe hemêz bikim. Kekê mino, bavê mino, birayê mino... Lê ez nikarim. A niha destên min bi te bibin ez ê wînda bibim. Ji ber ko ez mirî me, te ez kuştim... Axxx... Kekê mino, min çiqasî ji te hez dikir. Ma nayê bîra te gava em li ser daweta te dipeyivîn? Te ji min re digot, divê tu serê govendê bikişînî. Ma tê bîra te kekê mino? Tê bîra te bê ji daweta te re çiqasî hindik mabû? Piştî te ez kuştibûm bi salekê dergîstiya te jî xwe avêtibû ber tirênê û xwe kuştibû. Tam hûn ê wê rojê bizewicyana û min ê wê rojê serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê dergîstiya te bûbû mêvana min. Wê ji min re behsa rewşa te kiribû û wê gotibû piştî ko te ez kuştibûm, tu hatibûyî girtin. Wê jî îdare nekiribû. Ji derdê evîna te xwe avêtibû ber tirênê û miribû. Zû de ye haya min ji wê tune. Ji wê şeva ko em bi hev re li girtîgehê hatibûn xewna te û pê ve min ew nedîtiye. Ger ew bibihîze tu hatiyî berdan, ew li ko be ew ê were. Me çend caran bi hev re xwest em werin seredana te, lê gardiyanan em di-

tirsandin, em ji wan newêrîbûn bihatana. Dergîstiya te her li te difikire. Wê roja ko hatibû mêvandariya min, ji min re gotibû, bi çi awayî dibe bi-

la bibe, ez ê xwe bigihînim wî. Wê zewac li herdu dinyan li xwe heram kiriye. Ew li ser te dîn bûbû kekê mino, ew tenê ji bo ko te ez kuştibûm

8  
hebekî ji te qeherî bû. Lê roja ko mêvana min bû, min jê rica kiribû, ko kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ko ew ê te efû bike. Min jê re gotibû, çi dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike. Min gotibû, birakê min guneh e, pir diltenik e. Min gotibû, birakê min heta îro gêrikek neêşandiye, lê ez kuştîme, xem nake, ew jî ne sûcê wî bû kû... Xelkê lê wilo kir. Ger xelkê li te wilo nekiriba te ê ji kû xwaka xwe bikuştî? Wê ji kû destê te li min bigeriya? Min ji dergîstiya te re got, gava te bera min dabû, te çavên xwe girtibûn. Min got, destên wî li min nedigeriyan. Min got, wî pir ji insanan hez dikir. Ê min got, te ji min jî pir hez dikir. Ma ne wilo ye? Qey te ji min hez nedikir? Ma tu ji min hez nakî kekê mino?

Xilolîkên hêsirên çavên mêrik di ser riwê wî yê nekurkirî de gêr dibûn ser çena wî û paşê dinuqutîn erdê. Êdî ew mîna zarokekî bi îskîn digiriya. Wî dixwest serê xwe deyne ser milê xweha xwe û bi dengekî bilind bigirî. Dixwest uzra xwe jê bixwaze. Dixwest jê re bibêje ko wî çiqasî bêriya wê kiriye. Dixwest poşmaniya xwe bîne ziman.

Xwe winda kiribû. Ber bi xweha xwe çû, ko wê hemêz bike, lê xweh li ber geriya û jê re got, ko destê wî pê bibe, ew ê winda bibe. Lê mêrik xwe negirt, xwe avêtê; bi avêtina wî re keçik winda bû. Mêrik deverû, li hundirê odê kete xwarê û bi ketinê re serê wî li qorziya masê ket û serê wî

mîna ko perçe bûbe, xwîn jê hat. Ew bi şikandina serê xwe nehesiyabû. Heya ko diya wî ket hundir, bi qêrîn bang cîranan kir, hingê ew hêdî hêdî, mîna ji xeweke kûr şiyar bibe, bi ser hişê xwe ve hat û têgihîşt ko li erdê ye.

Ew barana ko di pencerê re li hundir xistibû, kaxiz û pirtûkên li ser

masê şil kiribûn û av herikîbû ser tej û xaliyên raxistî.

Bi alîkariya cîranan ew rakirin nexweşxanê, doktoran, ko yek jê hevalê wî yê zaroktiyê bû, serê wî pansûman kirin, bi xavikekê girê dan û ji bavê wî re gotin, da wî rakin Ankarayê, an jî ko îmkanê wan hebe, wî bibin Ewrûpayê. Bavê wî ji bêîmkaniya xwe gazin kir û ji bo bikaribe alîkariyekê ji cihekî bistîne, ji doktorê hevalê lawê xwe daxwaza hin şîretan kir. Doktor jî soza tiştê ko jê bê dayê û bi rewşa hevalê xwe yê zaroktiyê, ko ewçend zîrek û jêhatîbû, xemgîn bû.

Zîrektî û jêhatîbûna wî ji aliyê herkesî ve dihate zanîn.

Berî panzdeh salan, di îmtihana tîbbê de, ew di nav sed û pêncî hezarî de yê şêstemîn derketibû û ew hevalê wî yê ko niha li nexweşxaneyê bajarê wan doktorî dikir bi zorê bûbû yê hezarî. Wî hê di salên xwe yên lîseyê de piraniya klasîkên fransîz û rûsan xwendibûn û di qayîşkişandina

9

çîrokan ya rojnameya bajêr de bi çîroka xwe ya bi navê »Mêrikê Serxweş« bûbû yekemîn û paşê ew çîroka wî li Ewrûpayê ji aliyê hevaleyê wî ve li Almanî hatibû wergerandin û niha jî ew çîrok di antolojiyê de bi nave »Edebiyata Rojhilat« de li Almaniyayê ji aliyê weşanxaneyê naskirî ve hatiye çapkirin. Herkesî bi vê zîrekbûna wî dizanîbû. Heta, apê wî, yê ko reîsê belediya bajêr bû û gelekî jê hez dikir, soz dabûyê ko dê wî ji bo stajê bişîne Îngîltereyê. Lê gava kurtûpista ko wî di bin tesîra apê xwe de xweha xwe kuştiye, li bajêr belav bûbû, pir kesan bawer nekiribûn û ji bo ko dilê xwe têxin cih, ew bi hin karkerên belediyê re peyivîbûn. Karkerên belediyê jî nedixwestin diyar bikin ko serokê wan bûye sedema vê tragediyê, wan tenê bêdengî dipejirandin. Li gora dihat gotin û di nava bajêr de belav bûbû, çîrokê wilo dest pêkiribû: Xweha wî ya ko bi xweşikbûna xwe di bajêr de deng dabû xwestiya pismamê xwe bû. Biryara wê xwestinê jî hê di pêçekê de ji aliyê herdu biran ve hatibû dayin; lê herdu

zarokên ko di aliyê karekter de gelekî dûrî hevdu bûn û ew pismamê ko ji aliyê keçikê ve qet nedihat hezkirin û hebandin, ketibû derê riya wê. Keçikê jî hewesa xwe berdabû ser xortekî cîranê mala xalê xwe û rojekê gava êdi têdigihên ko tu riyên din tune, bi hev re baz didin. Ji bo şopê ji ser xwe dagerînin û nekevin dest, her gav cihê xwe diguherin, tu carî zêdeyî şevê li cihekî namînin, lê piştî sê mehan, li Îzmîrê, li barkêşekî nas rast tînin û barkêşê ko bi tesadufî bi reva wan hesiyabû û xelata ko apê keçikê ji bo girtina wan soz dabû, bihîstibû, timayî zora wijdan biribû û ji malbata keçikê re xeber şandibû, ji aliyê din jî bi dek û dolab û bi dostanî bi dû herdu dilketiyan ketibû û gava rojek ji rojên havînê ya herî germ ew bi apê keçikê, bavê wê û du pismamên wê re ketibûn hundir, herdu dilketî şaş û ecêbmayî mabûn, lêwîk hema destê xwe avêtibû destê hezkiriya xwe û xwestibû bazdin, lê apê kêçikê, yê reîsê belediyê bû û bi laş û gewde bû, hema xwe avêtibû qemçika paş stûyê lêwîk, ew ber bi xwe ve kişandibû, paşê heta jê hatibû ew ber bi dîwêr ve dehf dabû, piştî wî li dîwarê çimento xistibû, lawîk bi belqîn vereşiyabû, lê hîn berî ko ew bigihêje bi piştî destê xwe devê xwe pakij bike, vê carê lawê reîs, yê ko di nav malê de gelekî delalî rabûbû, lê pir tirsonek û ji aliyê laş û gewde jî de qet nelihev bû, heta jê hatibû kulmek li ser çavê lêwîk xistibû. Keçikê îdare nekiribû, êrîşî wan kiribû, gava apê wê xwestibû lêxe, destê wî gez kiribû, di wê kêlîkê de barîna ko ji apê wê hatibû bêtir barîna gayekî anîbû bîra mirov. Lê herdu dilketiyan herçiqas li ber xwe dabûn jî, dîsa nikaribûn xwe ji nav destên wan bifilitînin, heta ko tarî ketibû erdê ew bi dest û

10

lingên wan ve girêdabûn, ew avêtibûn dawiya dolmîşê û hezar û dused

kîlometre, digel ko tenê sê caran sekinîbûn, çûbûn. Di sekinandina cara çaran de, lêwik xwe bi awayekî vekiribû, weke guleya devê tivingê xwe di derî re avêtibû, xwe avêtibû dû pîqabek ko nuh ji benzînxanê hereket dikir û çûbû. Her çiqas hin ji van bi dû pîqabê de bazdabûn jî, pere nekiribû; pîqab zû derketibû ser rê û bi sureteke xurt ji wir bi dûr ketibû. Apê keçikê pîlaqa pîqabê nivîsandibû û ji mêrikê kal yê li ber benzînxanê pirsas wê pîqabê kiribû. Mêrikê kal heqê benzîna xwe jê stendibû, bi neyînî serê xwe hejandibû û pirsas wî bê bersiv hiştibû. Ew li dolmîşa xwe siwar bûbûn, ji benzînxanê derketibûn û piştî sê saetan, saet donzdeh û nîvê şevê gihîştibûn bajêr. Di ketina bajêr de gava dewriye di rê de li wan rast hatibû û dîtibû ko reîsê belediyê ye, silav lêkiribûn û bêyî ko li dolmîşa wan saxtî bikin ew berdabûn. Wan jî rast ajotibûn ber deriyê mala bavê keçikê, pismamê wê bi guliyê wê girtibû, ew ji dolmîşê derxistibû, di hewşê de bi dû xwe de kişkişandibû û biribû avêtibû hundir. Gava diya wê ji xew şiyar bûbû, keçika xwe ya mîna guleke bêstirî di wê rewşê de dîtibû, xwe negirtibû, xwe avêtibû ser wê, lê bavê keçikê çend pehîn li wê xistibûn, jê re gelek xeberên ne li rê dabûn û bi bazdana keçikê ew jî sûcdar kiribû. Paşê zilaman keçik di nav xwe de hilgirtibûn, ew biribûn xaniyê banî, ji nû ve girê dabûn, derî li ser wê kilît kiribûn û sê roj û sê şevan ne avek ne jî pariyek nan dabûnê. Dotira rojê mala apê wê ji birayê wê yê li Stenbolê re telefon kiribûn, lawik bi balafirê hatibû, li wê rewşê şaş mabû, pêşî bawer nekiribû, dû re gava apanê wî xistibûn serê wî

û xwestibûn ko ew namûsa xwe pakij bikin, di nava xelkê de dîsa weke berê bi serbilindî bijîn, jê re demançeke çekî ya ko destikê wê ji aliyê zîvkerekî asûrî ve hatibû neqîşandin, peyda kiribûn û xwestibûn ko ew bi destê xwe, wê dêlika xweha xwe bikuje. Pêşî lêwik qebûl nekiribû, herçiqas dixwest xweha xwe biparêze jî ji ber hin sedeman newêrîbî. Ew

bûyera ko di nava bajêr de belav bûbû, ji bo malbata wan ya naskirî kê-  
maniyeke mezin bû. Û ji bo ko dîsa rûyê malbatê spî bibe, şeref û namûsa  
wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû. Lêwik jî bi vê yeka han  
dizanîbû. Loma kuştina xweha xwe qebûl kiribû, demançe ji apê xwe  
stendibû, du caran ketibû hundirê oda xweha xwe, jê nîşan girtibû, lê dîsa  
jî destên wî lê negeriyabû, bernedabûyê, tenê li ser lingan rawestiyabû û  
ziq li xweha xwe nihêrîbû. Xweha wî jî stûyê xwe xwar kiribû, bi porê xwe  
yê jihevdeketî û bi rewşa pîreke çîrokî li birayê xwe nihêrîbû. Ne wê, ne  
jî birayê wê tişteke ji hev re negotibûn. Roja sisiyan gava birayê wê şev  
nîvê

11

şevê bi şidet derî vekiribû, xweha xwe li ser lingan di qorzîka odê de  
dîtibû.

Gava xweha wî çav li wî ketibû, mîna ko zanibe ew ê vê carê were  
kuştin, bi birayê xwe re keniyabû. Ew hingê li ber çavên birayê xwe bûbû  
weke pîrhebokekê. Lawik ji wê rewşa wê bêhawe tirsiyabû, weke ko tu  
satilek av bi ser de birijînî di xwêdanê de mabû. Çavên wî weke du bi-  
zotên êgir sor bûbûn û beloq bûbûn û bi qêrînekê re bera xweha xwe  
dabû. Gulleya pêşî ko berdabûyê mêjiyê wê ji hev belav kiribû û ji ber ko  
berra eynî cihî dabû, lê keçik bi gulleya pêşî re çokên wê fisiyabûn û hêdî  
herikîbû erdê, her heft gulleyên ko berdabûnê li eynî cihî ketibûn.

\*\*\*

Êvarî, gava wî xwe bi serê girêdayî li ser nivînê xwe dirêj kiribû û ziq li zikê  
odê dinihêrî, ew li wê yekê difikirî. Li salên xwe yên girtîgehê difikirî.  
Gelek serpehatiyên wî hebûn. Ew bi gelek kesan re rabûbû û rûniştibû.  
Gelek kesên naskirî dîtibûn. Ji bo derbaskirina wextê xwe û ji bo ko ew  
xwe ji bîr bike gellek pirtûk xwendibû. Paşê rewşa wî xerab bûbû, destê  
wî li xwendina pirtûkan sar bûbû, wî seredanên ko dihatin bi paş de vedi-

gerandin, heta demek pir dirêj bi heval û dostên xwe yê girtîgehê re jî nepeyivîbû. Ew li vê yekê jî difikirî. Paşê ji nişkê ve rabû û li ser xwe rûnişt. Piştî kurtedemekê jî çû odeya xwe ya xebatê. Berî panzdeh salan gava hîn berî ev bobelat bi serê wan de were, rewşa malbata wî ya aborî pir baş bû. Ji bilî xaniyê wan yê sêqatî, sê dikanên wan yên kincan jî li bajarê hebûn. Ew odeya xebatê bi tenê ya wî bû. Ew çû, dîsa li ber masa xwe rûnişt, herdu enîşkên xwe danîn ser masê, serê xwe xist nava kefên herdu destên xwe û ji pencerê li derve nihêrî. Ev yeka han ji roja ko ew hatibû berdan jê re bûbû mîna adetekê. Ji nişkê ve çavên wî beloq bûn û li dûr nihêrî. Erê, ew ne şaş bû, ya ko ji dûr ve xuya dikir û xwe li wî girtibû û bi firîn dihat xweha wî bi xwe bû. Lawik hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Xweha wî di pencerê re ket hundir û dîsa çû quncika xwe ya berê.

— Min ji te re gotibû, kekê mino, got. Min ji te re gotibû, ko destên te bi min bibin ez ê winda bibim. Niha divê tu destên xwe bi min nekî. Ger tu destên xwe bi min bikî ez ê dîsa winda bibim.

Carekê mîna ko winda bû lê dîsa xuya bû. An jî mêrik wilo hîs kir. Vê carê ziq li hêla xweha xwe nihêrî; dît ko erê, rast e, ya ko xwe di quncika

12  
xênî de kiriye qomik û stûyê xwe xwar kiriye, xweha wî ye. Xweha ko berî niha bi çend deqîqan bi kirasekî spî û tenik bû û rûyê wê gewr û hinarişkên wê sorik bûn, niha li ber çavên mêrik bûbû mîna berî bi panzdeh salan; porê wê ji hevdeketî, kirasê wê qetiyayî, zeyif û bêhêz. Loma mêrik ji nişka ve kire qîrîn û bi qîrînê re jî çend caran li ser hev got: »na, na!« Bi dengê qêrîna wî re dê û bav û xwişkên wî yên biçûk şiyar bûn, lê gava dîtî ko tiştêk tune ye dîsa çûn cihên xwe. Lê diya wî pencera oda wî girt, ew li ser mînderê da dirêj kirin, demekê li ber serê wî rûnişt û serê wî yê ko di rengê berfê de bû, mist da. Wî jî eynî weke zarokekî biçûk serê xwe



danî ser çonga diya xwe û herdu congên xwe kişandin zikê xwe. Diya wî gunehê xwe bi wê rewşa lawê xwe anî û ew lawê wê yê ko weke çiyayekî bû, lê niha ketibû wê rewşa xerab, dil û cergê wê disot. Ew demekê li zaroktî û xortaniya lawê xwe fikirî û ew keçikên mehelê ko ji bo lawê wê yê çeleng çiqasî xatir û qîmeta wê digirtin, bi bîr anî. Her ko diya wî serê wî mist dida, wî jî xwe hîn bêtir weke zarokê hîs dikir û hêsirên çavên wî weke dilopan diherikîn erdê. Diya wî jî ji bo ko hêsirên wê neherikin ser riwê lawê wê, bi destmala serê xwe hêsirên xwe pakij dikir û nifirên dinyayekê li mala apanê wî dikir. Mala apanê wî ko demekê tade û nehe-qiyêke mezin li wê kiribûn û ew apê wê yê ko bûbû sedema kuştina keça wê û bûbû sedema ko kurê wê têkeve wê rewşê.

Wê, nifir li wî apî dikir. Wê di dilê xwe de nifirên xwe dikirin. Wê digot, te warê min kor kir, Xwedê warê te jî kor bike. Wê digot, te mala min xerab kir, Xwedê mala te jî xerab bike. Wê digot, Xwedê ava reş bi çavên te de bîne. Wê digoot û digot.

Mêrik piştî demeke kurt li ser çonga diya xwe di xew re çûbû, lê diya wî ji bo ko wî şiyar neke, heya saet sisê şevê bêyî ko xwe tev bilivîne, di bin serê kurê xwe de rûnişt. Lê heya êdî ji ber tevizandina lingê xwe debar nekiribû, mecbûr mabû kurê xwe, ji bo ko ew here ser nivînê xwe razê, şî-

yar kiribû. Lawik jî ji nişkê ve ji xewê pekiyabû û ew xwêdana ko ji tesira xewna wî ya tirsê mabû bi piştî destê xwe pakij kiribû. Diya wî bi destê wî girtibû, ew biribû oda wî ya razanê, ew li ser nivînê wî dirêj kiribû, rûyê wî maçî kiribû, lampa wî vemirandibû, hêdîka deriyê wî girtibû û derketibû. Yê mêrik jî xewa wî nehatibû, piştî derketina diya xwe bi nîvsaetekê rabûbû ser xwe û dîsa çûbû oda xwe ya xebatê. Çer ko ketibû hundirê oda xwe ya xebatê pencera xwe vekiribû, lê dîsa girtibû, paşê dîsa

vekiribû. Vê carê ji nişkê ve ji hundirê odê dengê hatibû. Mêrik veciniqîbû, li paş xwe zîvirîbû, dîtibû ko dîsa xweha wî li quncika odê

13

stûyê xwe xwar kiriye û dixwaze ji birayê xwe re tiştinan bibêje. Birayê wê

jî hebekî berepaş çûbû, li quncika din ya odê li ser kursiyekê rûniştibû û wî jî bi stûxwarî li xweha xwe nihêribû. Carekê, mîna niqutî dilê wî ko ew ne xweha wî ye, bi tenê li ber çavên wî wilo dibe, lê weke xweha wî dizanîbû ew çî fikiriye, loma zûka ji wî re gotibû:

— Ez xweha te me, bavê mino! Ez Sorgulê me. Ez niha ji ba dergîstiya te tîm.

Mêrik dîsa jî baş lê nihêribû, ew xweha xwe ya berî bi panzdeh sal û çar-pênc mehan anîbû bîra xwe, dîtibû ko tu guhertin di xweha wî de çênebûne, ew spehîbûna xwe ya berî bi panzdeh sal û çend mehan hîna jî

parastiye.

— A îro min dergîstiya te dit. Wê got, ger tu herî silavên min lê bike, jê re bibêje, ez li benda wî me, ez ji wî pê ve kesî nakim, bila ew jî kesî neke. Wê dixwest bi min re were, lê nehat, wê got, jê re bibêje, bila ew were. Wê got, ma ne heqê min e ko ew were min bibîne. Min jê re got, belê, heqê te ye, ez ê herim kekê xwe bînim û werim. Ew niha haziriya me

dike, ew niha li benda me ye, çavên wê li riya me qerimî ne. De heydê kekê mino, heydê em herin.

Niha xweha wî çûbû ber pencerê, herdu destên xwe avêtibûn pencerê û ji birayê xwe re, yê ko dîsa hêsirên wî di ser riwê wî yê bi rih de diherikî re digot, »de haydê em herin«. Keçik di pencerê re derket û çû. Dengê wê

ji dûr ve di guhên mêrik de dikir zingînî: »Tu jî bide dû min keko, ez li benda te me!...«

Merik jî herdu destên xwe avêtin pencerê, hilkişiya ser û xwe bi dû xwe-ha xwe de avêt.

\*\*\*

Sibehê zû, gava mele ji mizgeftê vegeriya malê, ji dûr ve dît ko yek li kuçê dirêjkirî ye, kûçik û cewrikek li dora wî diçin û tîn û lingên wî bêhn dikan.

Her ko mele nêzîktir bû, fêhm kir ko ew lawê cîranê wan e. Gava wî xwe avêtibû, pêşî li ser zik ketibû, paşê qulupîbû ser piştê. Nîvê riwê wî yê çepê nemabû, mêjiyê wî rijiyabû erdê. Melê ew çend mêşên rengkesk yên ko dikirin vingînî, dane alî û bi destmalka xwe riwê wî nuxumand.

14

Dilê şikestî

Ew saet sisê şevê hat malê. Hêdî, bêî ko kesî şiyar bike derî vekir û ket hundir. Tesîra vexwarinê ji ser wî çûbû, lê dîsa jî hebekî dihejiya. Wî bi wê hejandina xwe çakêtê xwe ji xwe kir, bi dar de kir û bêî ko lampê vêxîne derbasî odeya xwe ya razanê bû. Jina wî ya ko ji êvar de xew neketibû çavan; her li benda wî mabû û xwe bi derewan li xewê danîbû, bêhngirtin û bêhnberdana xwe jî mîna yeke ko di xeweke kûr de be, girt û berda. Mêrik jî bi fikira ko wê ji xew şiyar neke, hêdî pantolonê xwe ji xwe kir, paşê gomlek jî ji xwe kir û ew avêtin wê rasta odê. Dû re bêdeng xwe li ser nivîna, li paş jina xwe dirêj kir. Bi ketina mêrik ya nava nivîna re, mîna ko jinik ji xewê şiyar bibe, xwe vezeland, bi derewa bawîşkî û bi dilekî xerab ji mêrê xwe pirsî:

— Tu hatî?

Mêrikê ko bêhna araqiyê jê dihat û wê şevê qet dilê wî û munaqesê

tunebû, bi dengekî nizim got:

— Erê.

— Ma saet çend e?

Wextî mêrik derew bikira û saet şaş jê re bigota, lê gava çavên wî li saeta li ser masê, ya ko di tarîtiyê de sor dikir, ket, mecbûr ma rastiye bibêje:

— Saet sisê ye.

Jinikê bi xwe dizanîbû ko saet sisê ye. Ji êvar de çavên wê ji wê saeta li ser maseya oda razanê neqetiyabûn.

— Tu heta niha li ko bû?

— Ez bîskê çûbûm mala Ehmed. Ji wir jê em çûn komelê.

— Ma komele heta vê saetê vekirî ye?

— Ma min got, komele?

— Erê, te got, komele.

— Na keçê, em neçûbûn komelê, em çûbûn mala Osman.

— Hûn çûbûn mala Osman?

Mêrik ji westandinê nizanîbû çi dibêje, ji xewê pê ve tişteke nedihat bîra wî. Wî dixwest kurt bibire û ji xwe re rakeve.

15

— Niha ez çûbûm ko, neçûbûm ko, ji te re çi lazim e?

— Çawa ji min re ne lazim e?

— Keçê dev ji min berde, ez bêxew im, ez ji xwe re rakevim.

— Tu bêxew î ne, çima na?

— Keçê, dev ji min berde! min ji te re got.

— Ez dev ji te bernadim. Te îşev çi kiribe divê tu ji min re bibêjî.

Mêrik bi kenekî ne ji dil got:

— Keçê, ma ez ê çi bikim?

— Tu dizanî tu çi dikî.

— Niha tu dikarî buhtanan jê têxî stûyê min.

— Na herê, melayiketên nola te dikarin çî bikin.

Mêrik dîsa kenekî ne ji dil, kenekî xav kir:

Bi wî kenê wî jinik qeherî, îcar bi dengekî hebekî bilind got:

— Ger tu ê vê bi min bikî, min bişîne welêt çêtir e. Ez hew dikarim îdare bikim, bes e ji derdê te!

Mêrik demekê xwe li razanê danî, lê nebû; gotinên jina wî yên bi hêrs û bi gazin qet firsend nedidayê ko razê. Wî bi xwe jî bi vê yekê zanîbû, lo-  
ma bêî ko lampê pêxîne, destê xwe dirêjî ser maseya nêzîka qeryole kir, rahişt pakêta xwe ya cigarê, cigarek jê derxist, pêxist û çend hilmên kûr li ser hev lê xistin. Jinik li benda wî bû ko ew tiştê bibêje, lê gava deng jê derneket, dîsa wê got:

— Ez zanim tu dîsa çûyî ba wê qehpikê, wê qehpika qûnmezin...Wê qehpika araqvexwir, wê qehpika ko nivê bajêr bera ser xwe dide...

Mêrik bi sert peyva wê birî:

— Wek kûçikan mereye! Zimanê xwe weke yê kûçikan dirêj meke!  
Jinekê jî bi hêrs bersiv da.

— Ger ne wilo be, bêje, ne wilo ye!

Gava mêrik bêdeng ma, jinikê dîsa got:

— Erê, ma ne wilo ye?

— Na, ne wilo ye! mêrik bi hêrs got.

Jinik êdî baş hêrs bû, her tişt da ber çavan.

— Wê çaxê ez ê jî bi riya xwe de herim, wê bi dengekî bi bawerî got.

Mêrik fêrî wan gotinên wê bûbû, vê carê jî ew cidî negirt:

— Tu bi ko de dicehemî biceheme, got û berê xwe jê guhert da ji xwe re razê.

— Ez ji te re dibêjim, jinikê got. Ger tu dev ji van awayên xwe bernedî

16

ez ê herim. Ez hew deqîqekê li vê malê disekinim. Ez ê zarokên xwe bibim û herim.

Mêrik pir westiyabû, hêdî di ber xwe de got:

— Here...

— Ez ê herim, jînikê got, ji nav nivîna hol bû û lampe pêxist. Mêrikê ko xwe hê jî tevnê livandibû, dîsa hêdî di ber xwe de got:

— Keçê, vê şevê dev ji min berde...

— Ez ji te re rast dibêjim, jînikê bi dengê bilind û nîvgirî got.

Bi dengê wê re zaroka wan ya biçûk ji oda kêleka wan giriya. Gava dengê zarokê hat mêrik, mêrik ji nav nivînê xwe rabû, şîmaqek bi hêz li ser çavê jînikê xist û hin çêr ji dê û bavê wê re kirin.

Di wê navberê de zarokên wan yê din jî rabûn, lê bavê wan bi ser wan de qîriya û zarok dîsa bi paş de çûne odên xwe.

Saet dihat çaran, tarîtiya şevê hêdî hêdî cihê xwe ji ronahiyê re dihişt.

Mêrikê ko ji ser ya xwe danediket, kirinên xwe rast didîtin û li kesê din guhdarî nedikir, vê carê jî dixwest bi ya xwe bike. Lê jina wî jî, ya ko bi a wî gelekî bi înad bû, ji ser ya xwe danediket.

Wê her çiqas dizanîbû piştî sê zik zarok hevduberdan ne hêsan e jî, dîsa biryara xwe dabû, ko mêrik careke din vê yekê bikê, ew ê dev jê berde.

Çend caran ew efû kiribû û mêrik jê re sond xwaribû, ko ew êdî hew tiştên weha dike. Lê wî tu caran sonda xwe bi cih netanî, piştî du-sê rojan dîsa ji mal winda dibû. Tew carinan jê ew bi şev jî nedihat malê. Şevên ko dihat malê jî, mîna îşev saet di sisê, an jî çarê sibehê de dihat.

Mêrik cigareke din pêxistibû, li ser qorziya qeryole rûniştibû, serê xwe berjêr kiribû û difikirî. Jînikê jî herdu destên xwe xistibûn bin çengên xwe û li derve, li xaleke nexuyayî dinihêrî.

Paşê jînikê berê xwe bi mêrê xwe ve kir; serê mêrik hê jî di ber wî de bû û kûr kûr difikirî. Ji dilê jînikê dihat ko wî bide ber kêran û bikuje lê dikir

nedikir nikarîbû jê nefret bikira. Her çiqas hin jinên hevalên wê ew şîret kiribûn û jê re gotibûn, dev ji vî mêrî berde jî, wê dikir nedikir ne dikarîbû dev ji mêr berdaya, ne jî gava mêr lêdixst, dikaribû li wî gilî biki-ra. Lê îşev kêr gihabû hestî, hatibû heta qirika wê. Ji xwe dilxerabiya ko îşev pê girtibû bûbû mîna gulokek mar û ketibû zikê wê. Ji dil bêtir zikê wê dêşiya. Hezkirina mêrê wê ya li hemberî wê keçikê, gotinên xweş ko ji keçikê re digotin, pê re razana wî, hemû dihatin ber çavên wê.

Gava ew li tiştên wilo difiki

rî dêhn dibû, aqilê xwe winda dikir. Vê carê jî wilo bû:

17

— Serê xwe mîna yê pîrekan nexer ber xwe, jinikê ji mêrê xwe re got û jê pê ve nizanibû wê çi bibêje.

Mêrik hêrs bû, lê wî jî tiştê negot, di cihê xwe bédeng ma.

Jinik dîsa peyivî:

— Îcar ji te weye ew qehpik ji te hez dike? Ew qehpika ko nîvê bajêr be-  
ra ser xwe dide. Wê qehpika pîs û qûnmezin...

— Keçê bes e! mêrik got.

— Ne bes e!

— Bes bireye!

— Ez bes nakim! Divê îro her tişt safî bibe!

— De tu çi gûyî dixwî bixwe.

— Ji mala min here! jinikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nava nivînê  
min! Nivînê min neherimîne!

Mîna ko mêrik bi sûcê xwe hesiyabe, deng nekir. Lê jinikê rahişt pan-  
tolon û gomlegê wî, bi hêrs avêtin ser wî û got:

— Ji mala min here, here ba wê qehpikê!

Mêrik ji cihê xwe pengizî û rabû jinikê; kê dera wê kete ber wî, lêxist. Ne  
got çav e, ne dest e, ne serî ye, ne pişt e; hema ko dera wê diket ber wî,

lêdixist.

Her ko wî lêdixist, jinikê jî dikir qîrîn û digot. Hersê zarokên wan şiyar bûbûn, hatibûn oda wan, ji tirsan xwe li hev pêçabûn û bi îskînî digiriyan. Ne haya dê, ne jî haya bavê ji zarokan çênebûbû, ew her bi hevdu re mijûl bûn. Nizanim çî li serê jinikê xistibû, serê jinikê şikandibû, ew xwîna ko ji serê wê dihat li ser kincên wê û li hundirê odê belav bûbû. Hîn ew wilo ji hev neqetiyabûn, hebe tunebe, wê cîranê wan ji polîsan re telefon kiribe, di demeke pir nêzîk de, otomobîla polîsan bi sureteke xurt hat, li ber deriyê wan sekinî û du polîsên dirêj, bi navmil, digel kûçîkekî xurt û şiyar, bi lez xwe ji otomobilê avêtin û bi êrîş çûn hundir. Bi fikira ko belkî mêrik li hemberî polîsan rabe û tiştêkî bi kar bîne, polîsekî demanca xwe jî kişandibû.

Lê mêrik li hember polîsan ranebû, mîna ko dizanibû wê polîs destên wî kelemçe bikin, herdu destên xwe dirêjî polîs kirin. Polisekî bi lez destê wî kelemçe kir, ew da pêşiya xwe û ew ber bi otomobilê ve bir. Paşê yek ji wan polîsan dîsa bi paş de vegeriya hundir, herçiqas birîna jinikê ne birîneke xedar bû jî, polîs ji ambûlansê re telefon kir û heta ambûlans hat, pirsên ko ji jinikê pirsîbûn, di deftera xwe de not girtin.

18

\*\*\*

Mêrik du mehan di girtîgehê de ma, meha sisiyan gava hat berdan, jinikê doza hevduberdanê lê kir û ew bi biryara mehkemê ji hev hatin berdan û zarok û xanî jî para jinikê ketin. Mêrik jî çû ba keçîkê. Keçîka ko ji bîst û du saliya xwe nuh ketibû bîst û sisiyan li nexweşxanê hemşîretî dikir. Meha pêşî gelekî xweş bi hev re derbas kirin, gelekî ji hev hez dikirin... Ji kêfa evîna hevdu re herdiwan jî hefteyekê ji cihê karê xwe îzin girtin û bi hev re çûn Lanzeroteyê. Ew bi şev û roj ji hev têr nedibûn. Ji çend saetên



xwarinê û ketina avê ne têde, wekî din ew her bi hev şa dibûn, hevdu mist

didan, bi hev re radizan.

Ne rojek, ne du roj, ne sê roj, wextê wan hefteyekê her wilo bi kêf, bi zewq, bi evîn û xweş derbas bû. Piştî ko ji tatîlê vegeriyan bi hefteyekê jî têtikiliyên wan wilo xweş bûn. Lê êvarekê gava keçik ji kar hat malê ne wek hertim bi kêf bû. Gava mêrik xwest wê hemêz bike û maçî bike, keçikê bi sarî ew maçî kir, cara didiwan wê berê xwe jê guhert. Sarbûna keçikê tavalê bala mêrik kişand. Lê berî ko mêrik tiştêkî bibêje, wê got:

— Divê tu ji xwe re xaniyekî bibînî. Ez dixwazim bi tenê bimînim.

Mêrik sar ma. Te heft xencer lê bixista piça xwînê jê nedihat.

Ev çi bû îcar? Ma ne wan ji hev re soz dabûn, ko ew ê bi hev re bimînin

û sala bê jî bi hev re herin Krêtayê, li wir destgirtî bibin û li wir du

hefteyên xweş û bi şahî bi hev re derbas bikin. Ma qey keçikê ev hemû tişt

ji bîr kiribûn?

Du-sê rojên din jî bi hev re man, lê ji hev gelekî sar, an jî keçik jê gelekî sar bû. Her çiqas mêrik dixwest wê hemêz bike an wê maçî bike, keçikê xwe bi paş ve dikişand an jî carê ji xwe re mijûliyek peyda dikir da ko ji mêrik rizgar bibe. Di hundirê wan du-sê rojan de jî tenê carekê bi hev re razan, ew jî ne ko jinikê dixwest, hema hema bêjin bi zorê bû.

Gava mêrik xwe da erdê û nexwest ji mala keçikê bar bike, keçikê jê re du roj mudet da û got ko ew vê carê bar neke ew ê ji polîsan re telefon bike û dê wî bi zorê ji malê derêxe. Ji ber ko mêrik gelek salan li Swêdê mabû û bi qanûnên Swêdê û azadiya jinan dizanîbû, ji xwe re zû ji destê dudan xaniyekî xwendevanan peyda kir û barkirê. Lê piştî ko bar kir jî her keçik azad nedihîşt; bi roj bûya, bi şev bûya, ji keçikê re telefon dikir û her carê ko telefon dikir jî nêzîkî nîvsaetê dipeyivî. Her çiqas ji keçikê

re digot: »çawa hezkirina te wilo dawî hat?« bersiva ko keçikê didayê jî her

»ez dixwazim bi tenê binînim« bû. Ji bo ko keçik jê pak bibe û êdî hew dengê wî bibihîze, wê nimra telefona xwe jî guhert. Vê yeka han tesîreke 19

ecêb li mêrik kir, dinya bi ser wî de hilşand. Her tişt li ber çavên wî reş bûn. Du sê rojan zor da cigarê û vexwarinê; hefteyekê neçû kar; dikir nedikir keçik ji bîrê nediçû.

Rojekê, danê nîvro gava li otobusê siwar bû, dît ko destê keçikê di destê xortekî ji Emerîka Latînî de ye û li ber camekana dikanekê rawestiyane û li kincan dinihêrin. Heta otobus li kuçê zîvirî jî wî di ser stûyê xwe re li wan nihêrî.

Heya bi çar pênc mehan bi zorê wî hebekî ew keçik ji bîr kir. Lê tenêti çiqasî nexweş bû. Bi tenê razê, bi tenê rabe. Bi tenê bixwe, bi tenê vexwe. Carinan jê wî bi saetan xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, çavên xwe bera nixteyekê didan û wilo bêdeng dima. Ger wilo dom bikira ew ê şerpeze û dîn bibûya.

Şev nîvê şevê rabû ji kevnejina xwe re telefon vekir. Jinik bi dengê telefonê ji nava nivînan pekiya û bersiv da:

— Elo...

— Elo, ez im...

— Xêr e tu vê şevê telefon dikî?

Her çiqas panzdeh salan bi hev re mabûn jî, dîsa wan çend mehan ew ji hev bi dûr xistibûn; mêrik nikanîbû mîna berê serbest pê re bipeyiviya.

Vê carê lawik kir sebeb:

— Min dixwest ez bi Temo re bipeyivim:

— Temo niha razaye û wê sibehê zû rabe here mektebê, tu dikarî sibehê piştî mektebê telefon bikî. Şev baş!

Jinikê telefon di rûyê wî de girt. Ev yeka han pir li zora wî çû, lê neda xuyakirin. Bîskekê xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, paşê cigarek pêxist; piştî ko cigara xwe kişand, dîsa telefon vekir.

— Keçê qet nebe em bîskê bipeyivin.

— Em ê çi bipeyivin? jinikê got.

— Li ser rewşa me

— Rewşa çi?

— Ma nabe ko em dîsa werin ba hev?

— Ez niha rehet im, dev ji min berde.

Erê jinikê wilo got, lê qet nebe ji bo zarokan bûya jî wê dixwest careke din bigihên hev.

— Keçê meriv carekê şaşiyê dike.

Jinikê dizanibû ko ew niha hewcedarî wê ye. Gava yek zeyif dikive, yê din xurt dibe. Jinikê jî xwe di wê deqîqê de pir xurt û bi hêz hîs kir.

20

Wê şevê belkî zêdeyî saetekê bi telefonê bi hev re peyivîn. Her çiqas mêrik xwest wê şevê here malê, yanî here mala jinikê jî, lê jinikê nexwest û piştî wê bi du rojan bi alîkariya hin malbatên din ew dîsa li hev hatin.

Ne ji wan bêtir be jî, bi qasî wan zarokên wan jî kêfxweş bûn.

Bi xwestina jinikê wan ji wî bajarî bar kirin û çûn li bajarekî din bi cih bûn. Mêrikê ko bi xwe hem li welêt, hem jî li Swêdê mamoste bû, dev ji mamostetiyê berda, bi hevalekî xwe re ko ew jî li welêt avûkat bû, lê li Swêdê li ser sosyalê dijiya, restorantek vekirin. Restoranta wan ko îro yek ji restorantên bajêr ya herî baş e, bi xwarinên xwe yên kurdî navdar e.

21

22

Şeva sersalê

Berî şeva sersalê bi hefeyekê, hevalekî Alan jê re telefon kir û xwest ji bo

pîrozkirina sersalê bi hin malbatên din re li malekê li hev bicivin û ji xwe re şeveke şahiyê çêbikin.

Herçiqaş Alan li ser riya Parîsê bû û bilêta xwe ya çûyîn û hatinê birrîbû jî, dîsa hevalê wî ew ji rê bir û nemaze ji bo ko wê Metîn Cansever jî beşdarî şeva şahiyê bibûya, xwest ko Alan jî ji wê şevê nemîne û ji salê carekê şeveke wilo xweş û bi reng bi hev re pîroz bikin.

Alan bi xwe navê Metîn Cansever çend carên din li hin cihên din jî bihîstibû. Lê li her cihekî bi awayekî behsa wî hatibû kirin. Ji bo Alan firsenda dîtina vî kesî nerevîne û qet nebe bi nas û hevalên xwe re di şeveke wilo de li hev bicivin, hema bi lez bilêta xwe ya balafirê, digel ko hinek pereyên Swêdî zêde bide veğerand, piştî wê bi rojekê bi telefonê li hevalê xwe geriya û ji bo beşdarbûna xwe ya şevê ew haydar kir. Hevalê wî yê ko ji eynî bajarî bû û li welêt muhendîz bû, lê li Swêd di restoranteke de firaxşoyî dikir û wextê xwe yê vala bi çêkirina resiman ve derbas dikir, bi nûçeya ko wê Alanê beşdarî şeva şahiyê bibe, pir kêfxweş bû. Êvara sersalê nêzîkî panzdeh kesan li mala hevalê Alan civiyan. Digel ko piraniya beşdarên şevê navsal bûn jî hê ew nezewicî bûn. Jinên du hevalan jî weke her sal îsal jî çûbûn welêt. Ji jina mazûbên û du keçikên swêdî pê ve tu jin tunebûn. Ew herdu keçikên swêdî jî hevalên du beşdarên civînê bûn. Lê ew zêde neman, hîn berî ko Metîn Cansever were, wan xatir ji hevalên xwe xwestin, li ser ligan tiştin ji hev re gotin û çûn. Metîn Cansever piştî hemiyan hat. Qatek kincên reş û gomlegekî spî li xwe kiribû, qerewata reşbelek bi ser de girê dabû û hê ji dûr ve bêhneke xweş jê difûriya. Piştî ko silav da civatê û ji bo derengmayina xwe ji nas û hevalên li wir uzra xwe xwest, bi nermî xwe da ser kursiyê.

Lixwekirin, nazîkî û kubariya Metîn Cansever tavalî bala Alan kişand.

Loma, bêî ko ew haya kesî bigihînê, wî xwe nêzîkî Metîn Cansever kir û hêdî çû û li ba wî rûnişt.

Piştî ko hemiyar bixêrhatinî dan hev, xwe bi hev dane naskirin û bi  
23

noşîn çend qedeh li hev xistin, Metîn Cansever hêdî di ser stûyê xwe re  
zîvirî û bi dengê nîzîm ji Alan pirsî:

— Ma xorto tu zûde hatiyî Swêd?

Alanê ko qet nebe bi sê-çar salan ji Metîn Cansever mezintir bû, bi  
nazikî bersiva wî da:

— Piştî du mehên din deh salên min têne dagirtin.

Metîn Cansever rahişt qedeha xwe ya şerabê, bilind kir, lê nihêrî, du-sê  
gulp jê vexwar, lêva xwe ya jêr mêt, serê xwe hinekî hejand û bi  
axînkîşandineke bêdeng dîsa ji Alan pirsî:

— Tu qet neketiyî, tu çend salî yî?

— Ez çil û sê salî me, Alan got.

— Pirs ne eyb be tu çend salî yî?

— Yê min tu lê nepirse.

Metîn Cansever dîsa rahişt qedeha xwe, vê carê li ya Alan xist, tiştê ko  
di qedehê de mabû bi ser xwe dakir û ji Alan pirsî:

— Tu çi karî dikî?

— Ger kar bête hesab, ez rojnamevan im, Alan got.

Metîn Cansever dîsa qedeha xwe dagirt, qurtek jê vexwar û bi dengê  
nîzîm peyva xwe domand:

— Min jî demekê rojnamevantî dikir, lê karê dokoriyê ez li paş hiştim.

Niha xebata min li ser romanekê heye. Roman li ser jiyana romantîkekî  
kurd e, ko di sedsala nozdehan de jiyaye û ji malbateke ronakbîr û têgi-  
hiştî ye. Min roman bi kêmanî deh caran nivîsandiyê û xerab kiriye. Tam  
deh salên min girt. Lê çi fêde, roman derkeve jî kurd jê fêhm nakin. Ji bo  
têgihîştina romaneke wisa kultureke bilind lazîm e. Lê tu a rastî bixwazî,  
ez vê ne ji bo kurdan dinivîsim, min bêtir berê xwe daye Ewrûpiyan. Ji

xwe berî kurdiya wê, dê ji aliyê du hevalên min yê nivîskar bi fransî û îngilîzî derkeve.

Hevalê Alan yê ko li kêleka Metîn Cansever rûniştibû, herdu guhên xwe miç kiribûn û li sohbeta wan guhdarî dikir. Gava Metîn Cansever li vê yeka han hayî bû, xwest peyvê dagerîne ser tiştêkî din, lê mazûbên bi ken jê pirsî:

— Ka ew pirtûka te derneket lo?

— Na welle, hê derneketiye. Mîratê xebateke dûr û dirêj jê re divê. Ji bo bidestxistina hin delîl û malûmatan divê ez herim Misrê û Sûriyê. Lê destên min ne vala ne, wergerandina hin klasîkan di destên min de hene. Ez niha bi wergerandina Tolstoy û Dostoyevskî ve mijûl im.

24

Her ko şev derengtir dibû, hewa sohbetê ewçend germtir û xweştir dibû. Li ser masa mitfaxê û ya oda rûniştinê tije xwarin û vexwarinên pirtexlît bûn. Hemiyar bi kêf dixwarin, vedixwarin, dipeyvîn, dikeniyar. Û cigare... Wan cigare ji cigarê pêdixistin. Wilo bûbû ko ji dixana cigaran çavan çav nedidîtin. Ji bo hênikkirina hundir û ji dixanê pakkirina odê çend caran pencere vekirin jî, lê dîsa ji ber nexweşiya Metîn Cansever tavilê girtin.

Bi lêdana saet donzdehan wan şûşeyeke şampanya vekirin. Yê ko şûşe vekir mirovekî navsal, bejindirêj, hebekî rûdagirtî, porspî û ji der û dora Diyarbekirê bû. Bi saloxan, wî di dema xwe de bingeha partiyekê avêtibû û di partiyê de jî karekî girîng girtibû ser xwe. Ew du-sê caran jî hatibû girtin, lê dîsa zû hatibû berdan. Li gora hevalên ko ew nasdikirin, spîbûna porê wî ne nîşana bîaqiliya wî bû

Piştî ko wî qedehên hemiyar dagirt û bi noşîn qedehên xwe li hev xistin, wî destekî xwe xist bêrika xwe, destê din jî danî ser masê û peyvî:

— Gelî hevalan, lihevkombûna me ya îşev rojek ji rojên welêt tîne bîra

min. Ew rojên xweşiyê, yên şahiyê. Lê şîreta min li we, ji siyasetê bi dûr bikevin. (Destê xwe danî ser porê xwe) Min ev por di siyasetê de spî kiriye. Min tam bîst salên xwe dane siyasetê. Ka min çi kir? Ka çî min heye?

Xortekî ko li quncikê rûniştibû û ta bi wê deqîqê deng jê derneketibû, rabû ser xwe û xwest peyva wî bibire, lê xwediye malê çav dayê û ew da rawestandî.

Mêrikê diyarbekirî her got. Ew geh hêrs dibû, bi dengekî bilind dipeyvî, geh jî dengê xwe dadixist, nerm dibû û bi bergerîn digot. Wilo bû ko êdî hew kesî guh dayê. Hinan gotin: »Serxweş e, dev jê berdin, çi dibêje bila bibêje«. Hinek jî rabûn, xwestin bi milên wî bigirin û wî bavêjin der, lê dîsa xwediye malê nehişt û ew dane rawestandî. Pir tê re neçû, mêrikê me yê Diyarbekirî xwe li quncikeke xênî avêt erdê û hema li wir di xew re çû.

Metîn Cansever jî êdî ji şerabê derbasî wîskiyê bûbû. Qedeha wî ya wîskiyê di destê wî de bû û li ber tabloyeke Picasso, Guernica, ya ko xwediye malê ji afîşekê çarçive kiribû û bi dîwêr ve kiribû, rawestiyabû û kûr kûr lê dinihêrî.

Wê yeka han dîsa bala Alan kişand, wî jî rahişt qedeha xwe, rabû û çû ba Metîn Cansever.

— Çi ji Picasso dikeve serê te?

25

— Picasso hosteyekî nemir e. Ne kesî berî wî mîna wî xweş çêkiriye, ne kes dikare piştî wî mîna wî xweş çêbike.

— Navbera te û Salvador Dali çawa ye?

— Digel hebekî dînbûna wî û têkiliyên wî yên bi Lorca re, dîsa jî ew surealîstekî xurt û mezin e.

Alanê ko qet nebe hin klasîkên dinyayê xwendibûn, di wê deqîqê de

xwe li ber Metîn Cansever pir biçûk û nezan dît. Wextî di dilê xwe de bigota »bi rastî va ye întelektuel ji nava me derdikevin« lê weke Metîn Cansever di dilê wî de be, peyv jê girt:

— Lê, pismamê Alan, ka ji me çi derketiye?

Dîsa berê xwe bi tabloya Picasso vekir

— Ka kî ji me dikare tabloyeke wisa çêbike?

Hebekî sekinî, dîsa got:

— Ka kî ji me dikare mîna Franz Kafka binivîsîne?

Wext bûbû derengê şevê, digel derengiya şevê, dîsa civatê kaseteke govendê danîbû ser, bi besteke xweş û bi dilşahiyeke mezin dîlanên kurdî digirtin. Yên ko nedireqisîn jî, bi stran û çepikên xwe govend geş dikirin.

Xuyabû ew vexwarina ko Metîn Cansever ji êvar de vedixwar tesîr lê kiribû. Ne ko serxweş bûbû, lê zêde dikeniya, zêde dipeyivî û her behsa muzîk û edebiyata dinyayê û behsa modernîzmê dikir. Paşê ji nişka ve li govenda geş zîvirî û bi dengê bilind got:

— Hela bes e bavo, we xwe kuşt!

Lê govendê her bi ya xwe kir.

Paşê ew li xwediyê malê zîvirî:

— Ka tu ji kereme xwe re ji me re muzîkeke klasîk deyne ser; Mozart, Bethoven...

Wextî xwediyê malê bigota, ev hewa ne ya muzîka klasîk e, lê dîsa jî ji bo ko dilê wî nehêle, ji mêvanên xwe yên din destûr xwast û sêlikeke Mozart ya ko di erzaniyê de kirî bû, da ser.

Xuya bû wê sêlikê dawiya şeva wan a şahiyê tanî. Hem ji ber derengbûna şevê û tesîra vexwarinê, hem jî ji ber ji bo wan nexweşbûna wê muzîkê, di wê bîskê de çend heb ji wan bawîşkîn.

Metîn Cansever jî kirî di xew re biçûya, lê ji bo ko di çavên beşdarên



şevê de kê m nekeve, bi alîkariya herdu destên xwe rabû ser xwe, yek bi yek destê xwe da wan, destûra xwe û çûyinê ji wan xwest û ber bi derî ve meşiya.

26

Alan û hevalê xwe jî pê re çûne ber derî. Metîn Cansever hêdî, bi cangiranî paltoyê xwe li xwe kir, pêlavên xwe xistin pê û bîskê jî li ser lingan peyivîn. Paşê, berî ko derkeve, destê xwe da xwediyê malê, destê wî bi dostanî guvaşt, spasên xwe ji bo şevê jê re got û hin rexne jî li organîzekirina şevê girt. Li gora ko xwediyê malê Metîn Cansever nas dikir, ew rexneyên wî gelekî normal dîtîn û bi devkenî ji bo sersala bê, soza organîzekirinek baştir dayê.

Metîn Cansever di wê navê de hejiya û wextî biketa, lê Alan bi lez ket bin milê wî.

— Haa, min wextî tu ji bîr bikira, wî bi dengê mîna yê serxweşan ji Alan re got. Tu ket serê min. Tu xortekî jîr û zîrek î. Binivîsîne, lê nûjen binivîsîne! Dev ji tiştên kevin berdin, bibin Ewrûpayî. Metîn Cansever bi wî awayî hejiya, derket û çû.

Ew berfa hûr û bayê xurt yên ko ji êvar de dihatin, êdî dawî hatibû û ci-hên xwe ji berfa gir re hiştibûn. Kuliye berfê li ber şewqên lampên kuçan weke minminîkên spî li ba dibûn.

Metîn Cansever stûkura paltoyê xwe bilind kiribû, herdu destên xwe xistibûn bêrîkên xwe, di nava kuliye berfê de bi hejandin dimeşiya û di ber xwe de stranek digot:

Hatasýz kul olmaz

Hatamlâ duy beni

Dermansýz derd olmaz

Derdimle duy beni

27

## Doktor Sertaç

Berî hevdîtina Doktor Sertaç û mamosteya unîversîteyê ya fakulteya edebiyatê Perwînê bi rojekê, Dr. Sertaç ji bo kirîna qatek kinc saet ji nehê sibehê heya bi çarê piştî nîvro bê ko raweste û bêhna xwe berde, li dikan û mixazeyên Diyarbekirê geriya. Ew diçû kîjan dikanê jî nîvê qatên kincên wan li xwe dikir û ji xwe dikir. Rebeno ne mexsûs wilo dikir, bi rastî jî tu kinc lê nedihatin; hemû an jê re teng bûn an jî dirêj bûn. Qatê dawî ko li dikana dawî li xwe kir, hebekî lê dihat lê rengê wî rengê pirr ecêb bû, kêfa Doktor qet ji wî rengê re nehat. Bi niyeta belkî bicibîne çend caran li ber neynikê çû û hat jî, dîsa nekete serê wî, ew rengê mîna xweliyê qet ew venedikir.

Piştî ko wî çakêt ji xwe kir, ji dikandêr pirsî:

— Qatekî din di vê mezinahiyê de, lê rengêkî din tune ye gelo?

Dikandarê ko temenê wî li dor bîstî bû, bejinzirav, dirêj û zerik bû, carekê du caran di ber qatên kincan re çû û hat, paşê ji Doktor Sertaç re got:

— Belê Welle, gerek qatekî din jî di wê mezinahiyê de hebûya, ger şansê te hebe ew ê nehatibe firotin.

Dikandar li wî qatê kincan geriya negeriya nedît. Lê dû re qatekî din ji nava kincan kişand, dirêjî Doktor Sertaç kir û got:

— Ev bi du numreyan jê biçûktir e. Lê ev malê Îskoçya ye. Numrên îskoçî carinan ji yê me mezintir in. Ka tu ji kerema xwe re vî li xwe bike, dibe ko li te bê.

Doktor Sertaç ew qatê kincan ji destê dikandar girt û bi cangiranî li xwe kir. Rengê qet xweşik bû, lê qet lê nedihat; wî ne dikarîbû bişkokên çakêt bigirtana, ne jî bişkokên pantolon. Doktor Sertaç bi eynî cangiraniyê ew jî ji xwe kir û da dikandar.

Ji westandinê ew êdî nikarîbû li ser lingan rawestiya; li ser kursiya dikandar rûnişt û bi destmalka xwe ya kaxezî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir.

Doktor Sertaç yekî kurt û dagirtî bû. Ji dagirtîbûnê jî wêdetir qelew bû.

29

Li gora hevaleyê wî ko ji min re behs kiribû, ew du caran ji bo wê qelewbûna xwe emeliyat bûbû, lê dîsa jî fêde nekiribû. Piştî emeliyata dudan ji ber sedemin nenas îcar porê wî weşiyabû. Ji ber weşandina porê xwe wî qelewbûna xwe ji bîr kiribû.

Piştî ko dikandar ew hemû kincên ko ji bo wî derxistibûn bi dar de kirin, kirî erza wî bişikanda û bigota: »Ma ev der çayxane ye ko tu li vir rûdinî«  
lê Doktor Sertaç berî wî peyivî:

— Min digot belkî karê dokoriyê tenê zehmet e, karê we jî ne rehet e.

Gava dikandar têgihîşt ko ew doktor e, bi nermî û bi devkenî jê pirsî:

— Ma tu tişteki venaxwî, çayekê an tişteki sar?...

— Belê Welle, tu ji kerema xwe re ji min re coca-colayekê bixwaze.

Dikandar bi dostanî destê xwe li paş stûyê lawikê şagirt ko temenê wî li dor deh salan bû û ji dirêjbûna porê xwe bêtir li keçikekê çûbû, xist û ji bo xwastina coca- colayê ew şand çayxaneyê herî nêzîk.

Lawik zû digel coca-cola û qedehekê vegeriya û ew li ser masê, li ber Doktor Sertaç danî.

Doktor Sertaç coca-colaya xwe berda qedehê, qedeh nîvî kir û hinek jê vexwar.

Paşê li saetê nihêrî; saet dihat çaran. Piştî çend saetên din wê piraniya dikanên kincan bihatana girtin. Lê diviyabû Doktor Sertaç ji xwe re qatek kinc bikiriya. Ji ber ko çî cara wî û mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê hevdu dîtibûn, her carê ew kinc lê bûne. Loma wî biryar dabû ko vê carê bi qatek kincên nû û xweşik derkeve hemberî Perwînê.

Piştî ko wî vexwarina xwe vexwar, ji dikandêr pirsî:

— Wekî din tu mixaze li van nêzîkan tune ye gelo?

Dikandar cihek got, lê dût bû, li aliyê bajêr ê din bû.

Doktor Sertaç rabû ser xwe û dîsa di ber kincan re çû û hat; destê xwe dirêjî qatekî kir û ji dikandar pirsî:

— Gelo min ev jî li xwe kiribû?

Dikandar çû ser kursiyê, ew qatê kincan ji jor daxist, hêdîka ew toza ko lê girtibû dawşand û dirêjî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaç ew qat jî mîna qatên berê di pişt perdeyeke biçûk de li xwe kir, ji pişt perdê derket, di

ber neynikê re çû û hat; piştî ko baş li paş û pêşê xwe nihêrî, di ber xwe de

kir niçe niç û got:

— Ev tam li gora min e, lê milên çakêt dirêj in.

Dikandar bişkokên çakêt girtin, milên çakêt bi qasî ko dirêj bûn lê wergerandin û piştî ko du-sê caran li dora wî zîvirî û lê nihêrî, got:

30

— Milên wî ne tê de lê wekî din tam li gora te ye. Ger tu bixwazî, terziyekî me heye, ez dikarim lêwik bişînim ba wî, ew ê ji te re di nîvsaetê de milên wî lê wergerîne û tu qet ferq jî nakî.

Ew yeka han ket serê Doktor Sertaç, bi kêf, lê bi cangiranî ji xwe kir û da dikandêr. Dikandêr jî ji lawikê şagirt re tarîf kir, jê re xist kîsikekî naylon û ew şand ba terzî.

Saet li dor çar û nîvan lawik ji ser terzî vegeriya. Xortê dikandar ew xweşik pêça, xist kîsikekî nû û ji Doktor Sertaç re danî ser masê.

Doktor Sertaç rabû ser xwe, dîsa bi destmala xwe ya kaxizî xwêdana ser çavê xwe û ya eniya xwe ya rût pakij kir, paşê destmala xwe xist bêrîka xwe

ya hundir, cûzdanê xwe derxist, buhayê ko dikandar jê re gotibû, bêî ko bazar bike pere hejmartin destê wî, rahişt qatê kincên xwe, bi devkenî xatir ji dikandar xwest, derket û çû.

\*\*\*

Ji ber ko ew êvarî her li Perwînê fikirîbû û dereng raza bû, adinî rojê dereng ji xew rabû. Hûn ya rastî bixwazin, razana wî bi tenê ew çend saetên dawî bû. Heta saet sisê sibehê, ew bi kêmanî şeş caran şiyar bûbû û her cara ko şiyar bûbû jî, hem li saetê nihêrîbû, hem jî çûbû daşirê avek rijandibû.

Ji bo ko miriyê xewê bû û ji tirsê ko ew ê di xew de bimîne, bi tas û was nivistibû, her xewn dîtibû. Ji bilî xewna ko wî di emeliyatê de bi şaşî nexweşekî xwe dikuşt, xewna Perwînê jî dîtibû. Dîtibû ko mamosteya fakulteya edebiyatê Perwînê, destê wê di destê mamosteyekî fizîkê de ye û di nav daristaneke bê ser û dawî de mîna du zarokên dilşa dibezin. Di xewnê de gelekî dilxerabî pê re çêbûbû, lê gava wî dereng, saet yanzdehan ji xew rabûbû û dîtibû ko xewn e, bêhna wî hatibû ber wî û ji ber ko dilxerabî mirovan biçûk dike, ew ji ber wê xewna xwe hebekî li ber xwe jî ketibû.

Li gora lihevkirina wî û Perwînê, wan ê li mala Doktor Sertaç hevdu bidîtina. Herçiqas Doktor Sertaç xwestibû wê biezimîne restorantekê û li wir xwarinekê bi hev re bixwin jî, lê Perwînê li hember derketibû û bi fikira ko ji diyarbekiriyên re nebe mijara kurt û pistê, wê mala Doktor Sertaç çêtir dîtibû û ji bo wê hevdudîtîna jî pêwîstiya tu xwarinê nedîtibû. Doktor Sertaçê ko ne bi dilekî lê bi heft dilan dil ketibûyê, dîsa jî li gora germa Diyarbekirê hê ji doh de hin xwarinên sivik amade kiribûn, ser 31

wan naylon kiribûn û ew di sarincê de bi cih kiribûn.

Saet ta bi donzdehan jî hê Doktor Sertaç xurîniya xwe nekiribû. Wî ne

bi tenê xurîniya xwe nekiribû, herweha ne riha xwe kurr kiribû, ne jî mîna ko her sibeh fikir, serê xwe şuştibû.

Saet donzdeh û pênc deqîqeyan rabû ser xwe, ji navê û bi jor ve tazî û bi zikê xwe yê ko weke merşekê pê ve daliqyabû, çû daşirê, piştî ko ji daşirê vegeyriya, deriyê sarincê vekir, qutîka şîr bi ser xwe da kir, ji ber ko devê qutîkê bêduzen vekiribû, hin ji şîr rijîya ser wî, ew şîrê ko bi ser wî de rijîya, herikî ser zikê wî yê mezin û di ser zikê wî re jî dilop bi dilop niqutî erdê.

Doktor Sertaç bi hêrs ew qutîk xist sarincê, bi piste pist xeberin da û bi paçikekî ew şîrê ko rijiyabû erdê pakij kir.

Ji do êvarî de nihêrîna saetê jê re bûbû wek nexweşiyekê, dîsa li saetê nihêrî,

— Wextê me hê pir maye, wî di ber xwe de got.

Û weke ko ji nişkê ve pirsek an jî tiştêk hatibe bîrê bi lez ber bi pirtûkxana xwe ve çû, pirtûkek stûr û bi reng ya di derheqa tîbbê de bû ji nava refên pirtûkan kişand, li ser linga pelên wê di ser hev re qulupandin, nêzîkî li nêvî kir, li wir tiştin xwend û paşê ew pirtûk dîsa bi paş de xist ci-hê wê. Lê îcar ansîklopediyê ko bi tîpa »K« dest pê dikir ji nav pirtûkan kişand, li ser dîwanê rûnişt û pelên wê jî di ser hev re qulipandin. Wî tu carî bendek an jî stûnek bi temamî nedixwend. Hûn ya rastî bixwazin, ji xwendinê bêtir, ji bo ko ew wextê xwe derbas bike wî li wêneyên pirtûkê dinêrî.

Saet çar û nivê piştî nivro, gava li deriyê Doktor Sertaç ket, wî hê xwe hazir nekiribû. Baş bû yê ko li derî xist ne Perwînê, lê parsekekî kal, ri-hdirêj û piştewiyayî bû. Doktor Sertaçê ko bi kurkirina riha xwe ve bilî bûbû û gwîzan li cênîka xwe ya çepê xistibû, bêyî ko bihêle Kalo zêde bipeyive û duan bike, du pelên kaxizî ji çavîka masê kişand û xist mista kalo.

Kaloyê ko herdu çavên wî mîna du morîkên hêşin di nava wê riha wî ya spî de diçûrisîn, bi dua û selewatan ji mala Doktor Sertaç bi dûr ket.

— Em ji derdê van parsekan mirin, Doktor Sertaç di ber xwe de got.

Diyarbekir bûye cihê parsekan.

Paşê dîsa çû serşokê û bi kurkirina riha xwe ya ko nêvcî mabû ve mijûl bû. Bi gwîzanê ko berê pê cênîka xwe ya çepê birî bû, vê carê jî nizanîm çawa kir, qirika xwe birî.

32

Ji ber senhetê xwe û şarezabûna xwe ya birînkewandinê, Doktor Sertaç tavilê bi derman û pembo ew xwîna han da rawestandin. Lo heya ko wî riha xwe kur kir, ew ji hal de ket.

Her carê ko wi gwîzan li riwê xwe dixist, ji ber kobûna gwîzên, çêr û xeberên dinyayekê dikir. Ji ber wê yekê, ew gelekî poşman bûbû ko ew neçûbû ser berber.

Gava dawiya kurkirina riha xwe anî û çavên wî li saetê ket, saet bûbû pêncê piştî nîvro. Wextê ko wî û Perwînê dabûn hev jî, di navbera pênc û pênc û nîvan de bû.

— Normal gerek ew di pênc û nîvan de were, Dokto Sertaç xwe bi xwe got.

Û bi rastî jî mamosta Perwîn tam di pênc û nîvan de li deriyê wî xist.

Doktor Sertaç bi pantolonê xwe yê nû, bi kêf, lê hebekî bi heyecan derî vekir. Mamosta Perwîn weke hercar vê carê jî desteyek kincên sivik li xwe kiribû. Kincên wê ji yên jinekê wêdetir weke yên mêrekî bûn. Wê bi wî awayî solên xwe ji pê kirin û ji tûrikê xwe, ko mîna tûrikên şivanan bû û bi sê gulîkên bi sê rengên cihê; kesk, sor û zer pê ve daliqyabû, pirtûkek derxist û diyarî Doktor Sertaç kir. Doktor Sertaçê ko eslê wî ji Xarpêtê bû û ji malbata Şêx Seîd bû qet nedixwest xwe siyasî nîşan bide. Lê dîsa jî ji bo xatirê Perwînê ew pirtûk bi kêfxweşî girt, bi kêfxweşî spasên xwe jê re

gotin, bi hev re derbasî odeya rûniştinê bûn û Doktor Sertaç ew li cihê herî xweş da rûniştandin.

Bi rûniştinê re wê çavên xwe li hundirê odeyê û li wêneyên dîwêr gerandin. Gava çavên wê li ser pirtûkxanê li wêneyekî Mustafa Kemal ket, hebekî ecêbmayî ma, lê dîsa jî ew ecêbmayîbûna xwe bi Doktor Sertaç neda xuyakirin. Wê Doktor Sertaç jî bi wê yekê hesiyabe, loma piştî bi nivsaetekê di nav sohbeteke li ser lîngan, ew guldanka kirîstal a li ser pirtûkxanê bi dizîka kişande ber wî wênekê Atatürk ê biçûk. Ancax piştî demeke dirêj mamosta Perwîn ew yeka han ferq kiribû.

Sohbeta wan ya pêşî li ser nexweşxanê û doktoran, paşê jî dageryabûn ser dibistanê û rewşa mamosta û xwendevanan. Ne li ser sîstema nexweşxanê, ne jî li ser sîstema dibistanê Doktor Sertaç û mamosta Perwîn li hev nedikirin. Herweha wan li ser sîstema welêt jî li hev nedikirin. Mamosta Perwîn digot, divê partiyeke kurdî ava bibe û ew partiya kurdî bikaribe di parlemanto de doza mafê gelê kurd bike. Û wê digot, ji ber ko kurd bêtir bi rewşa xwe dizanin, ew ê baştir bikaribin pirsên xwe jî çareser bikin.

33

Doktor Sertaç li dijî wê nêrîna mamosta Perwîn derdiket û digot ger ji bo kurdan musade were dayîn ew ê sibe ereb jî, çerkez jî, asûrî ji, ermenî jî, gurdî jî doza vî mafî bikin û ger bi vî awayî here ew ê Tirkiye hilweşe û ew ê Cumhuriyeta ko li ser heqiyê ji aliyê Kemal Atatürk ve hatiye li-darxistin, nemîne û bi vê yekê ew ê tenê kêfa emperyalîstan were.

Carinan jê jî gava têdigihîşt ko mamosta Perwîn ji wan peyvên wî aciz dibe wî xwe hebekî nerm fikir, ji fikir û nêrînên xwe yên salan digeriya û pirrê caran mamosta Perwîn biheq didît. Û hema piştî wê jî jê re digot, bê ew çiqasî ji wê hez dike. Wê jî digot, ko tu niyeta wê û zewacê tune ye û ger di pêş de bizewice jî ew ê bixweze bi yekî ko nêrîna wî nêzîkî nêrîna



wê ye re bizewice. Doktor Sertaç bi bergerîn digot ko erê ew niha wilo di-fikire, lê ew ê di pêş de nêrîna xwe biguhere û ew ê jî ji bo bi destxistina mafê gelê xwe têkoşînê bide.

Doktor Sertaç digot, ger ew bi hev re bizewicin wê bikaribin bi hev re xebateke zanistî bajon. Mamosta Perwîn jî jê re behsa wî mamosteyê fizîkê kiribû û gotibû, ew wê dixwaze, lê ji ber ko ew ji zewacê re ne hazir e, niha nikare bi kesî re bizewice. Ew ê dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbûbe, loma behsa wî mamosteyî kiribû û gotibû, wê rojê bi serxweşî ketibû hundirê pastexanê, ji hemû muşteriyên re xeber dabû, bi vê yekê han xortekî Siwêregî yê porxelekî ji cihê xwe pengizî bû û heta ko dev û pozê wî di xwînê de der kiribû, lê xistibû. Bi gotina Doktor Sertaç ko ne ji wî bûya, du xortên din jî xwe lê rakişandibûn, lê Dokto Sertaç û du hevalên xwe yê doktor nehiştibûn û heta yek ji wan bi wî mamosteyê fizîkê re çûbû malê jî. Mamosta Perwîn bi xwe bi wê pevçûnê hesiyabû, lê mamostê fizîkê bi awayekî din behs kiribû. Wî gotibû gava ew êvarî ji restorantê derdikeve, li kuçeya tarî du pêxwas riya wî dibirin, kêrê lê dik-îşînin û ji wî peran dixwazin. Gava mamosta peran nade wan ew herdu pêxwas bi kulman lê dixin, lê tam di wê navê de sê mirovên navsal di wir re derbas dibin û bi zorê wî ji nav lepên wan derdixin û heta yek ji wan zilaman jî birîndar dibe.

Mamosta Perwîn ew mamosteyê fizîkê parastibû û gotibû ew qet bi wî şiklî venaxwe û ger vexwe jî ew tu carî serxweş nakeve û ger serxweş bikeve jî bi tenê dikene, hebekî zêde dipeyive û henekan dike. Bi van gotinên mamosta Perwînê, dilxerabî bi Doktor Sertaç re çêbû, piştî kêlîkekê dev avêt lixwekirin û meşa wî. Paşê ji mamosta Perwîn pirsî ka bê wê û wî

mamosteyî tu caran bi hev re vexwarine an na. Mamosta Perwîn jî got ko bi tenê carekê di xelasoka dibistanê de hemû mamostan bi hev re şeveke

şahiyê çêkiribûn û wê jî hingî qedehek şeraba sor vexwaribû.

Doktor Sertaç di wê navê de şûşeyeke wîskî ko ji çaran yekê wê vala bûbû ji bara xwe derxist û du qedehên kirîstal ên wîskî jî derxistin, qedehek dagirt, kirî ya din jî dagirta, lê mamosta Perwîn destê xwe da ber û got ko ew ji wîskiyê hez nake. Doktor Sertaç got, ger ew ji wîskiyê hez nake, şeraba sor û a spî jî heye, ger ew bixwaze ew dikare jê re qedehek şerab bîne. Mamoste Perwîn ji wê yekê re jî got, na û tenê qîma xwe bi hinek ava pirtûqalan anî û got, berî şev dereng bibe, divê ew here malê; ji

ber ko wê hevaleke wê ya mamoste îşev were mêvandariya wê. Doktor Sertaç wê li ser hev vexwaribe loma hebekî serê wî xweş bûbû û du-sê çaran jî li ser hev çû tualetê. Cara dawî ko ji tualetê vegeriya, li nêzîkî mamost Perwîn rûnişt. Mamosta Perwîn jî xwe kar kir ko here, lê Doktor Sertaç li ber geriya û xwest ew kêliyêk din jî rûne. Di wê navê de jî Doktor Sertaç destê xwe dirêjî Mamoste Perwînê kir, destê xwe danî ser stûyê wê

û jê re got, ko wî tu çaran ji tu însanan ewqasî hez nekiriye. Mamosta Perwîn wek her car got, ko heya niha ew tu carî li zewacê nefikiriye û ger zewaceke wê hebe jî ew ê ancax di bîst û heft-heşt saliya xwe de bifikire. Doktor Sertaç jî gotibû, xem nake, em dikarin ji hev re soz bidin, dergistî bibin û heta êdî te dît wext e, wê çaxê em dikarin bizewicin. Gava wî ew gotinên han jî gotibûn, qirpika wî hilatibû, bêhna sîrê ya ko ji xwarina duh de mabû li ser çavên Perwînê ketibû. Ji bo Doktor Sertaç li ber xwe nekeve, Mamosta Perwîn berê xwe neguhertibû, lê piştî kurtedemekê, gava çavên wê li şûşeya wîskiyê ketibû, dîtibû ko şûşe li ber xelasbûnê ye. Wê Doktor Sertaç jî ew yeka han ferq kiribe, loma gotibû, ew ji wîskiyê pêve tu vexwarinên din venaxwe û gotibû vexwarina şerab û bîrayê bi

tenê himaltî ye. Mamosta Perwîn jî gotibû, kultura wê ya vexwarinê hebekî kême û hema bi lez li saeta xwe nihêrî bû. Gava dîtibû ko saet nehê şevê derbas dike, destûra xwe xwestibû û her çiqas Doktor Sertaç li ber

wê geriyabû jî dîsa ew rabûbû ser xwe. Li ber derî jî Doktor Sertaç bi bergerîna zarokekî li ber wê geriyabû û dîsa bê çawa ew ji wê hez dike, jê re li ser lingan behs kiribû. Carekê jî piştî xwe dabû derî, bi herdu destên xwe bi derî girtibû û xwestibû ji çûyîna mamosta Perwînê re bibe asteng. Di wê deqîqê de tirsek ecêb li mamosta Perwînê peyda bûbû, hema ji nişkê ve kiribû qîrîn, dehfek dabû Doktor Sertaç, derî vekiribû, di derencan de ji qatê pêncan bi bazdan daketibû jêr, di derketina avahiyê de li dergevan rast hatibû, lê li dergevan jî nesekinibû, derketibû der û bi gavên xurt lezandibû. Dergevan li wê rewşa wê ya bi kelecana ecêbmayî

35

mabû, lêva xwe berevajî kiribû, milên xwe hejandibûn û hêdî daketibû qatê avahiyê yê herî bin.

Doktor Sertaç jî li hundir, li ber derî, li ser zik dirêjkirî mabû, serê xwe xistibû nava herdu destên xwe û bi girîna zarokekî dikir îskîn. Car caran jî bi dengê hebekî bilind xwe bi xwe digot, »Kes ji min hez nake, ez ne spehî me, Perwiîn... ez ji te hez dikim!...«

36

Heyştê adarê

Di heştê Adara 1982an de, li komelê, di civîna di derheqê jinan de Mamosta Çetîn destûra peyvê xwestibû û bi germî dipeyivî:

— Gelî hevalan, ez ê li vir zêde behsa problemên jinên dinyayê nekim. Qesta min ne ew e ko problemên jinên dinyayê tune. Belê, hene... Bi hez-eran e... Problemên jinên ewrûpiyan jî hene. Ew jî bindest in, ew jî tîmêtin. Lê ji ber ko di vir de armanca min jinên kurdan e ez ê nexwazim

dûr û dirêj behsa jinên dinyayê û problemên wan bikim. Erê hevalno!  
Wek hûn dizanin, jinên kurdan bindest in. Ew hem cinsî, hem neteweyî,  
hem jî sinifî bindest in. Civata me civateke paşdemayî ye, civateke xwedî  
gelek bermayên feodalî ye. Di vê civata paşdemayî de, di vê civata  
nexweş

û bi sinif û bi berberî de jinên me yê xweşik û spehî di bin êş û zilmeke  
dijwar de dinalin. Ew weke heywanan tên kirîn û firotin. Ji wan re evîn  
tune ye, xweşî tune ye, jiyana tune ye. Ew kole ne, hevalno! Ew bindest in!  
Divê em xwendevan û ronakbîrên kurd li jinên xwe xwedî derkevin. Em  
keçên xwe bidin xwendin, em wan bigihînin, jinên zana ji wan derxînin.  
Em keçên xwe bi dilê wan bidin. Em jinên xwe bi xwe re bibin kome-  
leyan, civînan, civatan, dîlanan. Em wan bibin şev û şahiyên. Bila jinên  
me bixwînin, nûjen bibin. Gelî hevalan, bi kurtî, divê jinên me serbest û  
azad bibin!

Mamosta Çetîn bi van gotinan dawiya peyva xwe anî, ji bo destûra  
peyvê spasên xwe ji serokê civînê re got, ew gulpa qehwê ya sar, ko berî  
bi

nîvsaetê di binê fîncana wî de mabû, bi hêdîka, bê ko firrîniyê jê bîne,  
vexwar û çavên xwe bera sernaveke rojnama ko li ser masê bû da û  
bêdeng

ma.

Nêzîkî sih kesan beşdarî civînê bûbûn. Ji wan sih kesan bi tenê yek jin  
bû. Xuyabû peyva mamosta Çetîn baş tesîr li jinikê kiribû. Wê bi hêdîka,  
bê ko haya kesî bigihînê, bi destmalka xwe ya kaxizî hêsirên xwe pakij  
dikir.

Piştî mamosta Çetîn, yekî din jî destûra peyvê xwest, bi kurtî behsa  
dîroka heyştê adarê, tevgerên jinan, behsa rola jinan di têkoşîna sinifa

37

karker de, behsa feminîzmê û behsa ko çawa jinên kurd perçeyek ji tevgera jinên cîhanê ne, kir.

Civîna wan kurt, lê germ, bi munaqeseyan ve tijî û bi serfirazî dawî hat.

Mirov ev yeka han, piştî civînê ji rewşa beşdarên civînê jî ferq dikir.

Mamosta Çetîn piştî civînê jî bi du hevalên xwe re çû bîraxaneyekê û her yekî ji wan bîrayek du bîra jî vexwarin. Ew derengê şevê, saet li dor yanzdeh û nîvan çû malê. Digel ko mifta wî hebû jî, dîsa wî weke hertim li zengilê derî xist û li benda vekirina derî rawestiya. Di lêdana cara pêşî

de gava derî vebû, mamosta Çetîn carek du carên din jî li derî da. Bi lêdana sisê an çaran re, jina wî çavlixew û bi kirasê şevê li wî derî vekir.

Bi vekirina derî re mamosta Çetîn bi dengê bilind bi ser de qîriya:

— Ma qey heta ez bîst carî li derî nedim tu derî venakî?

— Deng nedihat min, jînekê bi çavlixewî got.

— Deng nayê te ne wilo? wî bi hêrs pirsî. Ger dengê Gulê bûya wê bi-hata te!

Gulê hevaleke jina wî bû. Ji ber ko ji eynî bajarî bûn û li welêt jî cîranên hevdu bûn, wan car caran hevdu didîtin.

Mamosta bi van hevdudîtinên wan aciz dibû. Sedema acizbûna xwe jî bi nebaşbûna Gulê ve girê dida.

— Çi ye, te xêr e dîsa? jînekê got.

Mamosta Çetîn çakête ko ji xwe kiribû dirêjî wê kir û bi hêrs,

— Hişş, dîsa devê te vebû, got, derbasî metbaxê bû û li herdu beroşên li ser ocaxê nihêrî. Gava ew xwarina ji firavînê de mabû, dît, bi dengê bilind got:

— Êdî te dev ji çêkirina xwarinê jî berdaye, tu bûyî xanim!

— Ne te got, ez îşev nayê şivê, ez ê dereng werim malê. Xwarina me jî hebû, min got heyf e ko ez vê xwarinê hemûyî birijînim û xwarineke nû çêbikim.

Mamosta Çetîn li ser lingan, hema wilo bi sarî çend kevçî jê xwarin û li ser kursiyê ber masa metbaxê rûnişt.

Jina wî jî, digel ko ew ji xewa gêj bûbû, li ba wî rûnişt.

— Rabe ji min re çayekê çêbike, mamosta bêî ko lê binihêre got.

Jinik rabû ser xwe, çaydan nêvî av kir, danî ser ocaxê û dîsa hat li ba wî rûnişt.

— Pir kes hatibûn civînê? jinikê jê pirsî.

— Erê, pir bûn, mamosta bêî dilê xwe bersiv da.

— Jin jî hebûn?

38

— Erê, tenê tu kêmbû (!)

— Ev te xêr e îşev?

— Min xêr e? Êdî tu ne xwarinekê çêdikî, ne kincekî dişoyî, ne malê paqij dikî! Tu ancax bi Gulê re rûnî û paşgotiniyan bikî. Binihêre! Careke din jî tu bêî xebera min neçî cihekî!...

Jinikê tu mane ji wan gotinên wî re nedît. Rabû ser xwe, jê re çaya wî dem kir, danî ber wî û xwest ko here ji xwe re razê.

39

40

Stêrkek ji ezmanê me xuricî

Piştî programeke televizyonê, ez bi cangiranî bi mêrdewanê ve bi jor ketim û çûm ser xênî. Yek ji tiştên ko min deh salan li Ewrûpayê hesreta wê kişandibû jî, razana li ser bana bû. Min gelekî ji razana li ser bên hez dikir û her êvar heta bi nivê şevê min xwe li ser nivînê xwe dirêj dikir, destên xwe dixistin bin serê xwe û min li stêrkên ezmanê welêt dinihêrî. Wê şevê jî min wilo kir. Bêî ko ez kincên xwe ji xwe bikim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir, destên xwe xistin bin serê xwe û di bin bayê payizê yê sivik û hênik de li stêrkên ezmên nihêrî. Gelo berê jî ezmanê welêt bi ewçend

stêrik bû? Çiqas stêrkin xweşik, çiqas diçirisîn. Ez di wê navê de li Leyla û Mêcnûn fikirîm, min ew jî dît. Min çavên xwe li riya Kadizê gerand, min ew jî dît. Min demeke dirêj bala xwe berda Leyla û Mêcnûn û ez li benda ramûsandina wan rawestiyam. Min ramûsandina wan bidîta, min ê ji xwe re tiştin bixwesta, tiştin hêvî bikira. Qet nebe me bi zaroktî wilo bawer dikir. Em heta bi derengê şevê li benda ramûsandina wan diman û

em wilo di xew re diçûn. Tiştê ecêb, gava ez li wan rojên xwe yên zaroktiyê difikirîm, min xwe mîna zarokan hîs dikir. Şewqa stêrkên ezmên ez dibirim salên min yên zaroktiyê. Di salên xwe yên zaroktiyê de ez heyrana şewqa elektirîkên bajarê Mêrdînê bûm. Nizanim gelo we tu carî bi şev di nêzîkî Mêrdînê re rêwîti kiriye? Şewqa elektirîkên bajêr wilo germ, wilo dostane ye, bajar ewçend bilind e ko mirov dibêje qey ew bi stêrkên li ezmên re qayîşê dikişîne. Ez di xeyalan de kûr çûbûm. Ez li ezmanê ewqas bilind û bêstûn ecêbmayî mabûm. Di wê navê de ne ji dengê diya min bûya, belkî ez bi saetan ji xeyalên xwe venegeriyama jiyana rastî. — Ma tu firrek çeqilmast venexwî lawê min?

Ez bi dengê diya xwe veciniqîbûm, min ew tasa çeqilmêst a ko hîn qeşa wê neheliyabû ji destê wê girtibû, çend gulp jê vexwaribûn, min paşê ew tas danîbû ser pirêketekî li ber serê xwe, min dîsa xwe li ser piştê dirêj kiribû û li ezmanê bê ser û bin û li stêrkên bi şewq û rohnî nihêribû. Û ez 41

wilo di xew re çûbûm. Lê ez nizanim çiqas tê de çûbû, ez bi dengê teqîneke ko bêdengî û kerrîtiya şevê çirand ve şiyar bûm. Bi şiyarbûnê re min dît ko ew stêrka li nêzîkî Leyla û Mêcnûn rijiya erdê.

\*\*\*

Sibehê zû li mala cîranê me dengên lîlandin û çepikan dihat. Min ji diya xwe pirsî, wê got: »Stêrkek ji ezmanê me xuricî, keçika cîrana me ya

berzewacê şehîd ket«.

Her ko roj bilindtir dibû, dengên lîlandin û çepikan zêdetir dibûn.

42

Xewna Orhanow

Piştî mayîna deh salan ya li Swêdê, Orhan biryara xwe da ko seriyekî here welêt.

— Ez çûyina xwe ji tu kesî re nabêjim, wî xwe bi xwe got. Ne ji hevalên vir re, ne jî ji malê re. Ger ez ji Serdar re bibêjim, ew ê ji her kesî re bibêje, ew bi devê xwe nikare. Ez nabêjim. Ez zanim ew ê dilê xwe bigire, lê tişt nabe, ez ê dîsa dilê wî xweş bikim.

Piştî bi du rojan wî firaxên xwe xistin hev, baholek tijî kinc û diyarî kir; lê ji nişkê ve ramanek hatiyê.

— Na, got, ez tu tiştî bi xwe re nabim. Ez ê destvala herim. Tew nebe ez ê li Tirkîyeyê diyariyan bikirim. Oooxx... Wê çiqas xweş bibe. Azadê birayê min çav li min bikeve, ew ê ji dûr ve baz de pêşiya min û mizgîniyê bide diya min. Lê niha bênamûso mezin bûye. Erê, erê, ew mezin bûye... Ma ne bavê min carekê di nameyeke xwe de nivîsandibû û gotibû: »Azad êdî mezin bûye, porê xwe şeh dike û ji keçikan re difîkîne«. Haa!...Ya baş ew e ez bi şev herim, bê ko kes min bibînin. Ez ê hêdî herim ber derî û li der bixim. »Kî ye?« Wê diya min bi dengê xwe yê zirav bipirse. Lê ez ê dengê xwe biguherim; ez ê bi dengê qalind bibêjim: »Derî vekin!«. »Tu kî yî?« wê diya min bipirse. Ez ê îcar dengê xwe zirav bikim, »Derî vekin, zû!«. Wê birayê min Xelîl ji nav nivînê xwe bipeke û pirtûkên xwe di nava kîsên genim de veşêre û wê diya min bibêje: »Lawê min ne li mal e, em

cihê wî nizanin!« Hingî ez ê bibêjim: »Dayê, ez im, derî vekin!« Wê birayê min yê navê bi dengê nizim bibêje: »Derî venekin, esker in, derewan dikin.« Derî vekin« ez ê bibêjim dîsa. Bavê min wê bibêje: »Weleh



ev dengê Orhan e.« Wê giş bi hev re baz bidin û derî vekin. Hingî ditirsim dilê diya min bisekine. Na, na, ez wilo naçim. Ya baş ew e ko ez bi roj herim malê. Dibêjin muxbir pir bûne, ma kî ê min nas bike? Ev deh salên min in ko ez ji welêt derketim. Hingî ne riha min, ne jî simbêlê min hebûn. Niha ez hatime guhertin; rih û simbêlê min şîn hatine û cênîkên min spî bûne.

Hîn wilo, çend caran li deriyê wî ket. Wî zû bi zû bahola xwe xist

43

dolabê, bilêta xwe ya balafirê ji ser masê hilanî, xist bêrîka xwe; baz da û derî vekir.

Serdar ket hundir.

— Oo, Serdar bi devkenî got. Ev çi kinc in te li xwe kirine? Tu ê herî konferansan an herî ba keçik meçikan?

...

Ew bi hev re derbasî hundir bûn û heryekî cigareyek vêxistin.

— Weleh êdî ez aciz bûme, Serdar bi derd got. Ev deh salên me ne ko em li vî welatî ne, ka me çi ji xwe fêhm kir?

— Va ye ez diçim, Orhan got. Ez ê herim mala we jî.

— Tu ê herî ku?

— Ez ê herim welêt.

— Eh, çawa ko ez diçim, tu ê jî wilo biçî.

— Weleh ez ê herim.

— Loo, de tu dev ji van haweyan berde. Ma tu ê min bixapînî.

— Ê baş e, tu bawer neke.

— Ji te weye ez bawer dikim?

— Tu zanî, dixwazî bawer bike, dixwazî bawer neke.

— De tu dev ji van haweyan berde, Serdar dîsa got.

Orhan bilêta xwe ya balafirê derxist û nîşanî wî da:

— Tu îcar bawer dikî?

Serdar bilêt ji dest girt û lê nihêrî:

— Tu dikî bi rastî jî herî?

— Erê, piştî nîvsaeta din divê ez herim. An na ez ê ji balafirê bimînîm.

— Ma haya malê ji çûyina te heye?

— Na, min ji kesî re negotiye. Min ji te re jî nedigot, lê tişt nabe, em hevalên hev in.

Bîskê li ser dûriyê, li ser keçikan û li ser siyasetê peyivîn. Dû re Serdar hin tembîh lê kirin û bi hev re çûn balafirgehê.

Berî ko Orhan li balafirê siwar bibe, Serdar got:

— Wî tiştê ko min ji te re got, tu ji bîra nekî ha!

Herdu hevalan destên xwe ji hev re hejandin û Orhan bi hewa ket û çû.

\*\*\*

Çaxa ew li balafirgeha Stembolê peya bû, kal û pîrek û sê xort hatin pêşiya wî. Pîrê xwe avêtîyê û bi girî got:

44

— Ooxx... şukur, tu hatî lawê min. Maşale, maşale, lawê min bûye mî-na şêrekî.

Dû re peyayê kal û hersê xortan xwe avêtinê.

— Ooh Gud, vi trodde aldrig att vi skulle träffa dig igen,1 peyayê kal got.

Ew dê û bavê wî û hersê birayên wî bûn.

— We ji ko zanî bû ez ê îro werim? Orhan bi ecêbmayî pirsî.

— Vi visste, bavê wî got. Vi vet allt. Det är Gud som meddelar oss? 2

— Tu ji ko hînî swêdî bû yî? Orhan bi şaşmayî jê pirsî.

— Hemma pratar vi svenska,3 diya wî got.

Bavê wî yekî bejinkurt bû. Porê xwe yê spî li ser piştê şeh kiribû.

Berçavkeke doxdarînî û hebekî reş li ber çavan bû û her dikeniya. Diya wî

bi du tiliyan bi ser bavê wî diket. Berî ko Orhan ji welêt derkeve, diya wî sernixumandî bû. Lê niha tu tişt li serî tune bû; serqot bû. Kirasekî kurt û vezelekî milkurt lê bû, zeyif bûbû û herdu gepên wê kort çûbûn. Ne dê û ne jî bavê wî ko ne ji lixwekirina wan bûna, ew zêde nehatibûn guhertin. Lê birayên wî? Orhan bi tenê yê mezin nas kir. Ger birayê wî yê mezin resimê xwe jê re neşandibûya, wî ê ew jî nas nekira.

Hersê bira jî bi ser wî diketin. Yê biçûk ji herduyên din dirêjtir bûbû.

Bejna wî zirav bû û qatek kincên reş lê bû. Herduyên din jî her yekî qatek kincên spî lê bûn û solên rengo mengo di lingên wan de bûn.

— Êê, we ji ko zanîbû ez ê îro werim? Orhan bi dengekî nîvgirî û bi hêvî pirsî.

— Me zanî bû, me zanî bû, bavê wî got. Erê tu ji Xwedê bawer nakî, lê wî ji me re got.

Dîsa wan yek bi yek Orhan hembêz kirin.

— De em herin, bavê wî got, ancax em bigihîjin ser otobusê.

Hemû bi hev re ber bi termînalê otobusê ve meşyan; li otobusê siwar bûn û berên xwe dane Diyarbekirê.

Di rê de diya wî ji aliyekî, bavê wî ji aliyekî û birayên wî ji aliyekî ve di pencereyên otobusê de bi destan der û dor nîşan didan û digotin: .

— Binihêre, me ji te re dinivîsand û digot, welatê me xweş bûye, bûye cenet, te bawer nedikir. Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hevdu nakujin, herkes ji hev hez dikan. Ma ne te jî wisa dixwest? Binihêre, binihêre bê çiqas xweş bûye.

— Erê Wele, Orhan got. Welatê me ji Swêdê jî xweştir bûye.

45

— Lo lo! Tew tu bajarê me bibîn!

Saet nehê êvarê otobusa wan li bajarekî sekinî. Bajar wêran bû û xaniyên bajêr yên bilind ji şûna gulleyan bûbûn weke seradê.

— Ev e bajarê me yê weke cenetê? Orhan bêhêvî pirsî.

Bavê wî,

— Na lawê min, got. Ev Bêrûdê ye, Lubnanê... Xelk li vir hevdu dixwin, herkes bi hev ketine, herkes hevdu dikujin. Ev jehrtêketiya Bêrûdê ye!

Orhan şaş û ecêbmayî mabû:

— Ger ev Bêrûdê be çima otobusa me di vir re diçe?

— Ew çîrokeke dûr û dirêj e, lawê min. Bi xêr ko em bigihîjin malê ez ê ji te re bibêjim.

Otobusa wan gihîşt Diyarbekirê. Çaxa ew ji otubusê peya bûn û ber bi malê ve meşyan, bavê wî got:

— Me ji te re negot ko bajarê me bûye cenet. Binihêre, ma ne weke cenetê ye?

Bi rastî jî bajar mîna buhuştê bû. Bedena wê ji nû ve hatibû lêkirin, hemû xanî spî bûn û her der hêşnayî bû. Mirov, dikan, otomobîl, hema her tişt hatibûn guhertin.

Birayê wî yê biçûk got:

— Te ji me bawer nedikir. Ka polîs? Ka esker? Ew çûn, dema wan çû. Dewleta wan jî çû... Em niha xwe bi xwe ne, em bi xwe dewlet in.

Ji bo Orhan sê rojan li def û zurnê ket, berx û beran hatin serjêkirin û şekir li zarokan hatin belavkirin. Roja çaran çar peyayên bejindirêj û bi navmil hatin mala bavê Orhan û bixêrhatinê dane Orhan. Piştî ko rûniştin, yekî ji wan got:

— Em endamên hukûmeta Kurdistanê ne û me bihîstiye ko te li Swêdê ekonomî xwendiyê, ji ber vê yekê em dixwazin tu jî di hukûmeta me de cih bigirî.

Hîn berî ko Orhan bersivê bide, lawikek bi bayê bezê ket hundir û bi heyecan got:

— Apê Orhan, baz de, xwe veşêre, esker hatin.  
Hîn peyva lêwik di dêv de bû, li telefonê ket. Lê kesî bersiv neda.  
Telefonê her fikir zire zir. Orhan rabû ser xwe ko baz bide, ew her çar  
peya jî rabûn û nasnavên xwe nîşanî wî dan,  
— Em polis in, gotin, tu çûyî Swêdê û tu li dijî dewleta me xebitî yî.  
Bide pêşiya me!

46

\*\*\*

Hingî Orhan ji xew hol bû, di karyole wer bûbû, li ser wê erda sar dîsa  
laşê wî di xwêdanê de mabû. Saeta wî jî her dikire zire zir. Saet li ser heftê  
sibehê lêdixist. Wî bi hêrs destê xwe li saetê xist û axînek kûr kişand.  
Rabû ser xwe û çû daşirê. Piştî bîskeke posta wî hat. Du name, dîploma  
wî ya ekonomî, kovarek û du rojname jê re hatin. Yek ji wan nameyan jê  
re ji malê hatibû. Wî bi lez ew name vekir û xwend. Gava di nameyê de  
bihîst ko birayê wî hatiye berdan, kêfa wî hat, bi lez kincên xwe li xwe  
kirin û çû mala Serdar. Serdar hê di xew de bû, bi tena derpîkê kinik jê re  
derî vekir.

— Çi ye, te xêr e vê sibehê? Serdar jê pirsî.

— Tu dizanî Serdar...

— Ez çi dizanim? Te dîsa xewnî ditîne?

Orhan keniya:

— Erê.

Serdar jî bi ken got:

— Wele tu li me bûyî Oblomov. Dawiya xewnên te nayên bavo. Xêra  
xwedê yek derketa, xewnên te binivîsandina û navê pirtûka xwe jî bikira  
»Xewnên Orhanov«. Êê, de ka bêje, tu dîsa dibûyî serokwezîrê  
Kurdistanê, an wezîrê kulturê?

Orhan keniya. Ew bi hev re derbasî mitfaxê bûn û ji xwe re taştê

çêkirin. Heya derengê rojê ew li ser xewna Orhan, li ser rewşa xwe ya li Ewrûpayê û li ser rewşa welêt peyivîn.

(1) Oo Xwedêyo. Me qet bawer nedikir ko em ê careke din te bibînin.

(2) Me zanîbû. Em bi her tiştî dizanin. Xwedê haya me digihînê.

(3) Li malê em bi Swêdî dipeyivin.

47

48

Kêzika bênav

Piştî rêwîtiyeke dirêj ez ji Şamê gihîştim Qamîşlokê. Ji bêxewiyê û ji guhertina hewa û xwarinê ez gêj bûbûm. Wê êvarê, her çiqas hin malbatên kurdan nexwestin ez herim hotêlê û bi çûyina min ya hotêlê dilê xwe girtin jî, dîsa min bi ya xwe kir; ji bo rehetiya xwe û bi fikira ko ez ê her roj bikaribim serê xwe bişom, ez çûm hotêlê.

Qaşo hotel luks bû. Ji xwe gava mirov ji derve li avahiya hotêlê dinihêrî, hotel gelekî xweş û luks xuya dikir. Li gora hotêleke Rojhilata Navîn û bajareki piçûk, ger em paqijiyê deynin aliyekî, hêwana wê jî ne xerab bû. Nizanim çima, lê dibe ji ber ko ez biyanî bûm û xwediyê paseporteke Swêdî bûm, ne şagirtên hotêlê, lê xwediyê wê bi xwe bi min re mijûl dibû. Gava mêrik odeya min û nivînê ko ez ê tê de razêm nîşanî min da, galonekî mazotê jî anî û ji min re sobe dada.

— Swêd sar e, lê şevên biharan welatê me jî sar e, bi ken got, şevbaşî da min û derket.

Ez demekê wilo bêdeng li ser nivînê xwe rûniştim û min çavên xwe li hundirê odê gerand. Ji serşuştin û razanê pêve tu tişt nedihate bîra min. Ji ber ko min dizanîbû wê saetê ava germ peyda nabe, di destên min de bi

tenê razan mabû. Her çiqas pakbûna nivîna ne bi dilê min bû jî, min kincên xwe ji xwe kirin, lampa xwe vemirand û hêdî ketim nava nivînê

xwe. Hema ko ez xilmaş bûm dengê xişxişekê hat min. Bi bihîstina deng re min bi hêz serê xwe ji ser bahlifê rakir, guhên xwe miç kirin û li wî dengî guhdarî kir. Îcar ne bi tenê dengê xişxişê, her wisa dengê çîzeçîzekê jî hat min. Ez bi xwe ji kurmik û kêzikan ditirsim, an jî ez ji wan zehf aciz im, loma ez ji nav nivîna pekiyam û min zû lampe pêxist. Çer ko min lampe pêxist, min dît ko tiştekek bilez ket qelîşteka dîwêr. Demeke dirêj sola min di destê min de bû û ez li benda wî tiştî rawestiyam. Di wê navberê de jî ji bo ko ez bê tirs bikaribim razê, min di serê xwe de plana ko ez ê çawa û bi çî awayî bikaribim wî benderuhî bikujim, çêdikir. Ez demeke dirêj li benda mam, lê ew derneket. Ez weha westiyabûm, ko êdî nikarîbûm li ser lingan rawestiyama. Min sola di destê xwe de danî û bê

49  
ko lampê vemirînim, min xwe li ser nivînê xwe dirêj kir.

Bi xişxiş û çîzeçîzeke din, min dît ko kêzikek mezin ji qelîşteka dîwêr derket û bi dîwêr ve rapelikî. Erê, bawer bikin min kêzikeke wilo qet nedîtibû. Herdu çavên wê sor wek du bizotên êgir bûn. Pozê wê reş û deqeke spî lê bû. Serê wê mîna serê mûrîyekê biçûk bû; lingên wê baş nedihatî xuyakirin, lê ji çaran zêdetir bûn. Gava diçû ber zikê odê rengê wê kesk dibû, ko xwe berdida jê rengê wê dihat guhertin, sorereş dibû. Min jî xwe li ser nivînê xwe dirêj kiribû, herdu destên xwe xistibûn bin serê xwe û li wê kêzikê temaşe dikir. Te digot qey ew bi min re ketibû qay-

işê, ez hêrs dikirim. Carinan bi lez bi dîwêr ve radipelikî, diçû ber zikê odê, demekê li wir radiwestiya, bi çavên xwe yê sor li min mêze dikir, serê xwe çend caran dihejand û dû re bi lez xwe berdida jê. Na, diviyabû ew kêzik wê şevê bihata kuştin, an na xew li min tunebû. Ez dîsa weke berê bi lez ji nav nivîna pekiyam, min rahişt sola xwe ko biavêjimê, lê kêzikê çivek da xwe û dîsa ket qelîşteka dîwêr. Ta ko ez li ser lingan bûm

ew derneket, lê gava min xwe li ser nivîna dirêj kir, ew dîsa derket û dîsa weke berê bi jêr û jorê dîwêr ve çû û hat. »Ya Rebî ez ê çi bikim?« min di dilê xwe de got. Tu nabêjî westandinê zora min biribû û hema ez bi wî awayî di xew re çûbûm.

Min xewneke ecêb di xew de didît. Di şerekî nenas de, hevalên min hemû şehîd ketibûn. Ez jî birîndar bûbûm û di nava xwînê de vedi-gevizîm. Bi wê birîna xwe ya xedar, bi rik û hêseke ecêb min xwe ji ber dijmin dida alî û ez bi çiyê ve radipelikîm. Ji bo ko ez xwe nedim dest û şopê ji ser xwe winda bikim, min xwe davêt şikeftê. Şikeft teng û tarî bû. Di wê şikefta teng û tarî de, ji nişkê ve marekî stûr û bi quloç êrîş tanî min. Demeke dirêj min û mêr li ber hev dida. Geh wî li min dixist ez bi çend gavan bi paş de dipengizandim, geh min lê dixist ew bi çend gavan bi şûn de dişand.

Dawî dawî min bi hêz destek lê xist û ez bi êşeke giran ji xew şiyar bûm. Gava ez rabûm, ez di xwêdanê de mabûm. Her du çongên min dihejiyan û xureke ecêb laşê min girtibû. Min kir û nekir çavê min yê çepê venebû. Gava min destê xwe danî ser, min hîs kir ko weke hêkekê werimî ye û tiştê pê ve zeliqî ye. Min ew tişt bi neynûkan da alî û bi çavê rastê baş lê nihêrî; min dît ko kêzika min e.

Ez hingî têgihîştim ko min di xew de destê xwe li ser çavê xwe xistiye û kêzik kuştiye.

Ji wê rojê pê ve ez neçûm hotêlê û heya bi hefteyekê bi zor werimandi-50

na çavê min daket.

Lê navê kêzikê ji min re bû meraq. Min ji kîjan xelkê Qamîşlokê, gundiyên der û dora Qamîşlokê, kurdên Şam û Helebê pirsî û kêzik ji wan re tarîf kir jî, her gotin:

— Xeyo, welle em nizanin.



51

\*\*

Ji wa anên Êketiya Nivîserên Kurd-Duhok

(130)

ÇÎROK

## MASÎGIR Û MASÎYA ZÊRÎN

Ji pirtûkxana Casimê Celîl

A.S. Pûşkîn

ÇÎROKA

MASÎGIR

A.S. Pûşkîn

ÇÎROKA

MASÎGIR

Û MASÎYA ZÊRÎN

Wien - 2012

Çapkîr Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

A. S. Pûşkîn: Çîroka masîgir û masîya

Werger — Casimê Celîl Rêdaktorî kir — Emînê Evdal Weşana pêşin —  
Yerevan 1937 Karê kompyûtêrê — Lûsika Gêrman Mizanpaj — Cemal  
Celîl (Alionis)

ISBN 3 - 902185 - 27 - 9

Mesîgirekî kal jina xweye pîr Kêleka bera mezinda diman.

Ji berê kalê tim mesî digirt, Pîrê jî malda teşî badida.

Awa tevayî wana emir kir, Holika kevnda sîsê sal tamam. Û rojekê jî kalê çû berê,

Ku mesî bigre bi tora berê. Kalê şa û eşq tor avît avê,  
Û cara ewlin lîl derxist tenê. Cara duda jî tor avît berê,  
Bi gîhê berê tor hat vê carê.

Lê cara sisya çaxê tor avît, Dikarin bêjin qe kalê çi dît?

Mesîke zêrîn torê derxist xwera Qîza zêr û zer ew qîza padşö, Mîna dîlekî ket tora kalê,

Qîza padşayö mesîyê tev bera. Mesîya belengaz tewaqe dikir, Bi zarê merîya jê hîvî dikir:

- Min b erde kalê, b erde bêzirar. Ezê bidim te pir hebûn û kar,  
Çi ku bixwezî, çi emir bikî, Bawarke tuê ji min bistînî.

Kalê metel ma û gele tirsya,

Ew ewqas sala mesîgir bû, Derheqa mesîyê ne bihîstibû, Wekî xeberde mînanî merya.

- Xwedê tera be, here, - go kalê, Lazimî min nine xizna te, male, Here, bigere nav pêlêd avê,

Li paşla berê û kûraya wê.

Kalê vegerya, hate mala xwe, Jina xwera got ecêba dîtî,

- Zanî çi, jinek? îro ji berê, Mesîke zêrîn min girt nişkêva, Ez zêr dibêjim, temiz zêrê zer, Ecêba awa kesî nedîtye,

Wê xeberdida eynî mina me.

Û hîvî dikir berdim wê ese: “Berde bêzirar, berde min berê, Ezê pir xizne bidime dewşê”,

Lê min ji mesîyê tu tişt jî nexast, Min gotê, here, here, aza be, Here bona xwe bera kaw û şîn, Çawa dixwezî usa jî bijî...

Çaxê ku pîrê ev yeka bihîst, Gelekî dilê kalê feqîr ket,

- Bêfem, bêaqil, - jinê got kalê, Qe na mesîyêra teê bigota, Teşteke teze bida boy malê,

Ya me şkestîye îdî kêr nayê.

Kalê vegerya çû berbi berê,

Dît pêlê berê dilîstin bin bê, Gazî mesîyê kir ewî wê demê,

Û mesîya zêrîn hate ber kevîyê.

Tu çi dixwezî, de bêje kalê? Kalê silav da û da caba wê:

- Dia li te be, tu padşa mesîya, Min rezîl dike jina mine pîr, Rehetîyê nade min kalemêrî, Dike kute-kut, çêrî min dike, Teşteke teze bide boy malê,

Ya me şkestye îdî kêr nayê. Gunê mesîyê hat û gote kalê:

- Xwedê tera be, here tu malê, Pîra jina te bira hêrs nebe, Teşteke teze îro wê hebe.

Kalê hate mal bi pê leze-lez,

Û dît ber jinê teşteke teze.

Jin razî nîbû vê carê dîsa,

Kalê rezîl kir û da xebera,

- Bê femê heram, te teştek jê xast, Ji teştö çi kar? De tu here rast, Diha neseke, şûnda vegere,

Ji mesîya zêrîn malekê bixweze.

Kalê vegerya û çû berbi berê,

Dît pêlê berê ser hev diçin tîn, Hêdîka gazî mesîya zêrîn kir,

Û mesîya zêrîn hate ber kevîyê,

- Tu çî dixwezî, de bêje kale?

Kalê silavda û da caba wê:

- Dia li te be, tu padşa mesîya, Zef ez êşandim jina mine pîr,

Rehetîyê nade min kalamêrî,

Ew pîra sêrbaz malekê dixweze.

Gunê mesîyê hat û gote kalê:

- Xwedê tera be, here berbi malê, Çawa dixwezî, bira usa be, Maleke teze îro wê hebe.

Vegerya berbi mal mesîgirê kal. Betavebibû mala wîye kevn, Xanîkê teze dît bi pencere, Dûköşk jî hebû li ser banê wî. Sobe û derî, gi sivaxkirî,

Bi kils û kîrêc tev sipîkirî,

Ji darê palûd derî çêkirî,

Bi destê hoştta ew darda kirî. Binîya pencerê pîra pirpişî,

Ji babaxîyê ew bû biteqe cîbcî, Dinêda çiqas ku nifir hebû, Temam ser zar û zimanê wê bû. Çaxê hinekî hêrsa wê danî,

Gazi kalê kir bi medekirî,

- Ay kalê bêfem, malek te jê xast, Te tiré zef tişt ji mesîya zêrîn xast?

Vegere, here paşda berbi berê,

Û ji navê min bêje tu mesîyê,

Diha naxwezim bimînim gundî, Dixwezim bibim xatûna cindî. Vegerîya çû ber bera hêşîn,

Dît pêlê berê hêrs diçin û tîn, Hêdîka gazî mesîya zêrîn kir,

Û mesîya zêrîn hate ber kevîyê,

- Tu çi dixwezî, de bêje kale?

Kalê silav da û da caba wê:

- Dia li te be, tu mesîya zêrîn, Rehetîyê nade jina mine dîn,  
Diha naxweze bibe ew gundî, Dixweze bibe xatûna cindî.

Gunê mesîyê hat û gote kalê:

- Xwedê tera be, here berbi malê, Ji îro şûnda pîrejina te,  
Bira ji gundîtîyê idî aza be.

Paşda vegerya û çi dît kale?

(Wî tiré xewn bû, ber çeva vebû) Maleke bedew, sivdera jorin,

Pîrê sekinîye mînanî xatûn, Xwekirye êlek ji postê werşeq,

Li serî kofi, dilê wêye eşq,

Stu xemilî bi morî, mircan Tilîda gustîlk, qaşê cewahir, Kondire pêne bi  
rengê xût sor,

Û libasê lé tev hevirmişin,

Li ber destê wê gele xulamin.

Mêrê xwe ku dît, ew gele har bû, Lêda xulama ji çûk û mezin.

Kalê bi ricaf nêzîkî wê bû,

Ber wê pête da û wa gote wê:

- Roja te bi xêr xanim-xatûna min, Niha tu razîyî, diha hêrs nabî?

Wê pîra sêrbaz usa kir qîrîn, Ziravê kalê qetya cîb-cî,

Emir kir, wekî dest xweda here, Tewelê temizke û wir ebûrke.

Du sê led ancax hê derbazbûbûn, Ew xatûna pîr dîsa har bibû,

- Zû bilezîne, - gote mêrê xwe,

Û ji navê min mesîyêra bêje,

Diha naxwezim stîtîyê bikim, Dixwezim, wekî bi xwe padşa bim. Ser vê xeberê kalê ricifî,

Bi tirs û ricaf wa gotê ewî:

- Jinik, dîn bûyî, ez te fern nakim, Gelo tu zanî qe çi dixwezî?

Ca xwe binhêre, bejin û bala xwe, Zimanê xwe til, rêçûna xwe xar. Layîqî padşê çi heye ser te,

Wekî dilê te usa dixweze,

Were bibihê, gura mida be? Temamîya dinê wê me bikene. Diha tab nekir pîrka meye pîr, Kalemêrê wê xeberê kutake.

Usa kir gazi û usa qîrya,

Ku ban û dîwar tamam ji cî hejya. Çawa dil diki ay mêrê kotî, Şemaqek lêda lê kire gazî:

- Tu turiş diki, nepakê nezan, Min xatûnêra bikevî rikê,

Ez emir dikim emirê maqûlî,

Dest xweda herî bi xwestina xwe, Hergê ku naçî va vir xulamin. Kalê vegerya çû kevîya berê,

Bera hösîn tamam reş bibû,

Ewî hêdîka gazî mesîyê kir,

Û mesîya zêrîn hate ber kevîyê,

- Tu çi dixwezî, de bêje kalê?

Kalê silav da û da caba wê:

- Dia li te be, tu mesîya zêrîn, Dîsa şer dike jina mine pîr, Bibaxşîne min, ez zef şerm dikim, Xwestina pîrê ji tera bêjim? Rehetîyê nade, ez küda herim? Ketime agir û xilaz nabim,

Divêje, - here, - ew jina kafir,

Û ji navê min mesîyêra bêje,

Naxazim diha stîtîyê bikim, Dixwezim bibim ez padşa aza.

Gunê mesîyê hat, wa gote kalê:

- Xwedê tera be here ber bi malê, Bira xwestina jina teye pîr be,

Ji îro şûnda padşa aza be.

Dikarin bêjin kale qe çi dît,

Wextê vegerya, berbi mala xwe hat? Diha çi mal-hal, dewsa wê yekê, Köşk-serak mezin pöşberî xwe dît, Minarêd bilind sûrkirî tamam, Serayêd bedew, otax bêhesab,

Meriv şaş dima, ku diçû hundur,

Û çû hundurê koşk-sera fire,

Ber çeva vebû dîdemek teze,

Çaxê ewî dît pîrejina xwe,

Jina wî bibû padşake aza,

Û bi kêf û eşq ser text rûniştî,

Mîrêd pir mezin, tamam xan û beg, Mîna xulama şpya sekinî,

Bona wê padşö dadigirtin îçkê,

Û bi tirs û xof çeva dinhêrîn, Sivderê tije esker sekinî,

Şûrö zilfeqar li ser milê wan, Tenê pîrê bû ser text rûniştî,

Û kes newêrbû, bi wêra rûništa, Lê xwarin-xurek ewqa pir zef bû, Ku têra  
temam sed merîya hebû, Çi xurekê xaş bi cûrê teze, Temam qelandî û tijî  
bû rez.

Pîrê nan dixwar bi medekî xaş,

Bi fincana kaw îçke vedixwar,

Û axrîyê jî totikê şîrin xwar,

Ko tema wana bimîne ser zar.

Ev yeka ku dît kalê ecêb ma,

Ewî xwe avît pîyê jina xwe:

- Slav ji tera, tu padşa zor,

Mezinaya te timê dinê be.

Pey vê xeberê ewî piste-pist,

Wa pîrsî hêdî pîra jina xwe,

- Niha, wekî tu bûyî xayî bext,

Ez texmîn dikim, wekî razîyî.

Ew pîra padşa qe xeber neda,

Qe nenihêrî rûyê mêrê xwe,

Bin pozê xweda ewê emir kir,

Ku berî wî din, bivin ji wira.

Hema ku emirê padşajin derket, Temama hazirîya xwe nîşan danê, Mîrê  
pir mezin, tamam xan û beg, Mînanî tejîyê nêçîrvana bûn, Wana du-sê  
kulm li kartikê dan,

Û ji koşk-serê berî kalê dan. Qerewilê bi şûr sivderê sekinî,

Bi balte hazir berbi kalê bezîn,



Her yek bi xwera hat ji alîkî,  
Û hindik mabû, ku bijenin wî.  
Bi teherkî kalê aza bû,  
Û derva tamam pê kenyan, şabûn, Kû meriv tiré bin baran-heryê, Temam  
civyâyî mabûn lê hîvîyê,  
- Çiqas rind kirin, ay kalê nezan,  
Gava xweye xar kêra davêjî?  
Bira ew yeka bive pak şîret,  
Ku carke dinê neyêyî tu nêzîk.  
Awa du-sê led pey hev derbaz bûn, Û hersa pîrê dîsa pir rabû,  
Ewê mîrê xwe şande pey kalê,  
Ku wî bivînin û bînin balê,  
- Niha tê herî bal mesîya zêrîn, Dilxastina min wêra wa bêjî,  
Tuê kunde bî, silavê bidî, Dilxastina min wêra wa bêjî:  
Bêje, naxwezim bivim padşajin, Dixwezim bivim xudana bera,  
Berê bêkenar bin destê minbin,  
Û mesîya zêrîn xulam be bal min. Ku ew li ber min timê hazir be,  
Çi ku bixwazim hertim biqede.  
Kalê ker û lal guhdarîya wê kir, Ewî tu xeber negote pîrê,  
Vegerya û çû ber kevîya berê,  
Dît lî bera mezin ba û bagere,  
Bi dengê melûl gazi mesîyê kir,  
mesîya zerin nezîkî wi bu:  
- Tu çi dixwezî, de bêje kalê?

Kalê silav da û da caba wê:

- Mesînga zêrîn, tu timê remî, Jina mine pîr dîn bûye tamam.

Çi bêjim jêra, xebera nabînim, Hetanî kengê dêstda bizêrim? Diha naxweze bimîne padşa, Binhêre, pîrê qe çi dixweze, Dixweze bibe xudana bera,

Û ebûr bike berê mezinda,

Berê bêkenar kûr û fireda,

Ku mesîya zêrîn xulama wê be,

Çi ku bixweze, ji tera bêje

Û xwestinê wê cîb-cî biqede,

Û mesîya zerin ker û lal bihîst. Û neda ewê caba wî kalî,

Poçka xwe li rûyê berê da,

Û bi ker ew çû kûraya berê.

Gele ma hîvîyê kalê bi melûl,

Lê mesîya zêrîn diha kivş nebû. Kalê vegerya ku bêje jinê,

Wekî qezîke çawa lê dest da.

Û çû, qe çi dît? Çi bibe pake? Dîsa holika kevn bû ji xalyê, Jina wîye pîr rûniştî bin sîyê, Ew teştî şkestî dîsa li ber wê.

\*\*

## MEMÊ Û EYŞÊ

Wien - 2012

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 11

Sîras

Memê û Eyşê

Poêma cimeta kurmanca

Werger H.Cindî

Wien - 2012

Memê û Eyşê

Ew kîjan xort bû, wekî cîda can neda, ew çito dil bû, wekî di xweda neşewitî wê şevê?

Wê şevê, şeva sayî, Eyşê ji hîvê şewq ve-dida, wê şevê, şeva evînê. Eyşê usa bedew bû, ji hîvê sipîtir, ji rojê zertir bû.

Ewe notlani zinarêd memleketê bavê xwe gelekî kubar bû, mînanî teyrê Sîmir serbest û serfinyaz bû, minanî mêrxasekî navdar bû, bejnê bilind bû nola dara sipindarê, nola çirakê bû, çevêd wê meriv digot yê şerane: awqas zerbedest bûn.

Usa dêm qemere bedew bû, ku royêra derdiket û meriv hewes û hizmekar bû lê binêrya. Lê wextê hêrsê, mînani bayê samê dinya bê risq dikir.

Eyşê yeke usa bû.

5

Nava wê mehelê da tek Memê bû, ku Eyşê xweş hat, ew begem kir, Memê jî bi dilekî na, bi hezar dilê ew heband. Memê, Memêyê delalê dilê Zozanê, ewî çîqa keçik ser xwe bengî kirin, çiqasra jî bê xew û sewdeser kir ewî Memêyî.

Û çaxê mirazê Memê û Eyşê bi hev bû, Zozana pîr car din terecan bû, hat ser bengê berê, notlanî qîzeke çardasalî jîr û serbist vî alî - wî alî difitili, direqisî.

Îda ew Zozan nînbû, ya ku di deh salya xweda tewle û pangê axê paqîş dikir, sibê heya êvarê sakarê rêx li ser piştê bûn, carîtiya jinêd axê dikir, heta nevtengê quzî tendûrê dibû, loş vedikir, weke bejna axê û kirdinek hertim di bin piçengada bû.

Çi merûmî belengazî, çi av û hêsir û zelûlî ... heta Memê gihîşt, destê wî dar girt, Zozan diha pîr bû, ji tutar ket.

Memê bîst salî bi Eyşa hîjde salîra awqa li hev dihatin, ku gava teyrê Sîmir li rû ezmîn difirya, Memê û Eyşê didît, nêçîra xwe bîr

7

8

dikir, nêçîr ji nav lepê wî diket û bi dîtina çeva, bi muhbeta dila dîna xwe dida herduya. Gelek çara menegîyê erd pêkol dikir, direqisî, lê gava Memê û Eyşê didît, ji eşqa herduya her tişt bîr dikir, pişt li ber Memê û Eyşê xwar dikir.

Eyşê bi evînya dila Memê hebandibû, ji wê jî eşq Zozanê peyda bûbû. Hemû jî bi zewaca herduyara eşqlû bûn, hemû jî kêfxweş bûn, gişk jî şabûn, wekî mirazê Memê û Eyşê bi hev bû.

Lê Tahar axa tevî wê eşqê nebû, nekenya, di xweda werimî, ji kerba xwe kila, ji cegerê nelya. Hêrsa, kef devê wî ket, çawa ku hespekê tu zef cirîda bidêyi, tilhanê wê rabe, kef dêv keve.

Ewî ber çevê xwe dît, ku Memêyê xulamê wî Eyşê stand: zef ber xwe ket, di xweda nihicî, wê biteqya ...

Eva ew Eyşê nibû, ku Tahar axa bi destekî usa defand, wekî heta îro jî serê wê digere. Carya ber derê mala wî, pêjberî axê

9

sekinîbû, rê nedabû axê, tibistî dabûyê bi axara şer kiribû, ra ruyî rûyê axê bûbû: yê Tahar axa.

Lê îda axatîya wî ji kê rojêrane, çend kapêka hêj aye, îdî ku xulam pêşyê lê digire, ya ewî qebûl kiribû, xulam jê bistîne? Nebû xurê wî. Kesî dîbû, xulamê meriv rabe, ya axê jê bistîne. Zef jî Eyşê Memê hizkirye? Zef jî Memê mirazê xwe bi wê husilcema lera kirye?

- Na ew bi xwe axaye û her tiştî berê ewlin gerek ew bi xwe tem bike.

Û fermana Tahar dîsa rabû: gazî egît, efatê xwe kir, lê berî gişka deyî li Memê kir.

Ewî bi kubar û bi ferman got:

- Hûn vê royê dibînin? Heta ku ro dîsa bê vî çaxî, gerekê hûn nava xulamêd şêx Cewadda bin, wekî Zîlana kokbir bikin, xwe lya tendûrê di ser wanda bêjing bikin.

- De bilivin, xwedê komeka wera be ... Ferman û emrê axê bû, gotina wî her tişt bû û Memê dil bi xem vegerya hate malê.

Du hêsir ji çevê Memê pekyan û berjêr gilol bûn.

- Na, Memê dilê xweda sêwirî, - bira dilê Eyşê û dayê nequse, - bi eşq kenya û wanra got:

- Eyşê can, dilê xwe fire bike, zendêd xwe jî bişidîne wekî kolozê Memêyê xwe qot bigirî, - û rûyê Eyşê melûl, bi şewat ramûsa, ramûsa çevêd wê reş belek.

Ewî dayk hemêz kir û gotê:

- Dya min, deynê xulamtiye, deyn gerekê vegeirînim.

- Eyşê binêrî, bira dilê wê nemîne, porê serê te jî reş bibînim.

Û wexta Memê çolê li ser piştta hespê cirîd dida, Tahar axa hêja bi dilekî rehet rûnişt nimêj ê. Eyşê û Zozanê jî wekî dilê hev xirav nekin, hêsirê xwe mînanî tavîyê baranê di xweda diquriçimandin.

\* \* \*

Şeş sal hatin derbaz bûn, şeş cara dara biyê kulîlk veda, lê sala hefta, gava ku wê 12 dîsa kulîlk veda, Memêyê Zozana pîre reben li Eyşa melûl dîhar bû ...

Tahar axa jî çil cara cab kir, çil cara qewil û qirar kir, weke çil carî jî cêriband birevîne, hema Eyşê ew Eyşê bû, ku qe hestu jî neavît nava dev û qîlêd wî, xeberêd wî kapêkek he-sab nekir, mîna mêrxasa kubar ma û

kolozê Memê qot kir, serê wî serfinyaz kir, dil da Zozanê, ji wê dil stend û bi xudana enyê xwe ebûra xwe kirin, hewceyî tu qûl û bendeyî nebûn. Eyšê nola kevotka ber zinara, mînanî hîva glover berî êvarê rabû ber pencerê, pala xwe dayê, herdu gurcika sûretê xwe kire nava destê xwe û rya dirêj mêze kir.

Eva ew rê bû, wekî Memê têda çû, wekî rojê hezar meriv diçin û ji wana zêde ji wî alîda tîn û Eyšê her ro dereqa Memêda pirs û hewal dikir.

Niha jî bi cirîda syarekî hespê boz dihat.

Enya wî xû dabû, ba li pêşê arxalix dixist, li hev dizvirand. Ew îdî nêzîkî pencerê bûbû

13

14

Û xerîb-xerîb mêze dikir. Dilê Eyšê nola çivîka davit. Dilê wê quloz dibû: him şabûna, him kerba ... Ewê milê xwe hejand û got:

- Syaro, serê min bi qurba, emirê min bi gorî, keremke, peyabe, Memê min îsal heft sale çûye eskerîyê, keremke, were nanê me tem bike û bêj e tu ji kêderêyî, kîyî, kî nînî? Eger cabeke xêr heye, pak, eger na, bi xêr û silamet di rya xweda herî.

Ewî syarî jî wa got:

- Rindê, nan û textê te zêde be, şên be, kêmasya te tunebe, şeva işevin mêvanê teme.

Nava her heft salada eva mêvana ji gişkî serbestir bû. Eyšê ji xeberê wî nexeyîdî, derket devra, serê hespê westyayî girt û wextê syar jê peyabû, hesp bire tewlê, girêda û êm tijî ber kir.

Û gava zivirî, şûnda hat, xerîb berbi oda xwe bir. Ewî jî tiving, şûr û mertalê xwe ji st yê xwe anî xarê, ji stûnêda dardakir, bi destekî koloz ji serê xwe derxist, ku xudana ser paqîş bike. Eyšê kire axîn û axîn û kesera wê heft sala nola çemê biharê li hev keve,

15

tevî hev bû, kire qîrîn û pêra-pêra xwe avîte pêsîra Memê, delalîyê dilê xwe.

- Wey Memê, wey Memêyê bêbext, tu bi çi fen û fêla hatî?

Memê jî digot: - Lê kî dikare bi sînore te keve, bermalya mine delal.

Eyşê li ser sîngê Memê, Memê jî serê wê hemêz kir û bi ramûsanê şîrin kul û derdê her heft salê dirêj bi carekê bîrkin.

Memê got: - Eyşê can, de here, mizgînyê bide daykê, wekî bê sobeta bêje, xeber bidin.

Eyşê got: - Ax, Memê min, bihêle dayka pîre-reben îşev rehet razê, sibê xeber bidin, niha şîr û mast bînim, buxun, vexun û kêf bikin.

Memê tu tişt negotê, bejn bala Eyşê ew têr kiribû, hine şîr vexwer, lingê xwe şûşt û bi şewqa hîvê hevdu hemêz kirin û ketin cî-

• A

nIVIna ...

Gava ku sibê gewr bû, Zozan ji cîyê xwe rabû, sê cara ji dil û ceger "ax" kişand, sê cara gazî Xwedê kir.

16

Ew ji derdê Memê bû) ku dihelya û dimaşya. Nava her heft sala gelek derd û kul dilê xweda xwey kiribû) heft sal bû) ku dil dida Eyşa terlan) wekî usa melûl, wekî usa bi hisret) miraz çevada mabû. Ewê mûkûrya Memê dikir) çevê wê li rêya mabû.

Xûna wê hela dikelya, zendêd wê hê ser benga cahiltyê bûn) ewê dema dîna xwe dida bejn bala Eyşê) ax dikir) xûn dikişya nav dilê wê) mirazê wê ji sebabya Memê) çevada mabû) dilê wê disût.

Zozanê wexta ku cî-nivîn qatî ser hevdû kir) nêzîkî bixêrîyê bû) Eyşê wêderê hertim kûpkê nimêjê dadani, wekî Zozan nimêjê bike) wekî ji

Xwedê tuala hîvî bike bona vegerandina Memê û sebrkirina xwe û bûkêda.

Zozan serê xwe hejand û got:

- Hey gidî Eyşê) te gelo bîr kirye) erê) rin-dika min) qêmîşî te nabim ... gelo çi nêta xirab ketye q elpê te) ku te ev şuxula nava heft salada bîr nekir) te îro bîr kir. ..

17

Zozanê jixwe halara digot û dibiland.

Çaxê ji ser texte peyabû, çû berbi tewlê, wekî kûpikê nimêjê bîne, hew nihêrî hîrînya hespekî kete guh ...

Zozan sekinî. Xwe fikirî û got:

- Ew çi dengê hespa tê, dibe hesp tewlêda- ne ... mêvanê min, xerîb kura hatye, bê mala min, hespê wî jî tewlêd bike hire-hîr?

Zozanê bi dawa dêre çevê xwe temiz kir, cîyê ku her ro valabû, îro ber afir hespekî bozî kubar girêdabûn ...

Zozanê dîsa xwe û halara got û bilind got: - Hey gidî Eyşê, paşî Memê min, dengsedayê mêvana bikevin ber guhê min, tu jî ber mêvana herî-bêyî, cabê nedî min ...

Çima min sîyanet û hurmeta mêvana bîr kirye? Mêvan, mêvanê Xwedêye. Ne ez çiqas mêvana hiz dikim, awqas jî Memê xweyî tayê tenê hiz dikim .... Hey gidî Eyşê.

Û lingêd Zozanê, cardin şidyan, nava wan her heft salada nimêj cara ewlin bîr kir

18

Û ber bi odê lezand, ku Eyşê wan heft salada têda radibû, rûdinişt.

Zozanê derê odê vekir û çû hundur. Ode tarî bû, tîrkek tevê avîtibû hundur, dabû ser cî. ..



Zozanê hizingek kûr rahişt û çevê xwe mizda û nişkêva got:

- Pî, bi simila, eva ci tevaye?

Eyşê razabû, kêleka wê jî zilamek. Ewî bi evîntî Eyşê hemêz kiribû: destek dabû ber serê wê, yek jî bera birbû, hemêz kiribû, evîntyta heft sala pê girtibû û ketibû xeweke kûre şîrin.

Ewê got: - Hey gidî Eyşê, gelo namûsa te çawa namûs bû, te kir bin pê xwe. Min ronaya çevê xwera Memê mezin kir, Memê xweyî xerîbî xerîbstan. Memê eva heft sale çûye eskerîyê, çito namûse li te. Eyşê can, te qewl, qrarê heft sala pêpes kir, te kolozê Memê min berjêr kir, tu ketî nav cî, belgîyê lawkê zilam.

Tamarê Zozanê li hev ketin, kerba xûn têda miçiqî, xûna wê tevî hev bû, qewat li wê

19

20

berev bû û bê hemdî xwe nêzîkî stûnê bû. Çek û rextê mêvan bi stûnêva darda kirîbû.

Zozanê eynelû bi fesal girte destê xwe û bi herdu desta mehkem girt. Sifte lûlê nihêrî û paşê serê wê nêzîkî mêvanê Eyşêyî hizkirî kir ...

Zozanê got: - Çi zilamekî egîte, ezê mêşa wî hema ji textka enyê bigirim

...

Got û sekinî.

- Na xêr. Eyşê can, nebû, usa nabe, dengê eynaluyê wê belabe, gund û cînar wê bibhên, dinyayê me bihise, Tahar axa wê seh bike, dilê wî wê şa bibe, navê te kevotka perbelek wê xirab be, navê bûktya te heftsalyê wê roda here. Memê min jî wê bê, bibhê hêrsa Memê jî wê rabe û dilê wî wê bişkê, serê wî wê berjêr be, îda ruyê wî nagire bi xelqêra xeber bide.

Paj da hat û eynelû stûnêda darda kir. Şûnda zivirî, hat, dît ku mêvan ji lezbûnê xençerê xwe ser belgî hişt ye, banzda, hilda, çeka wê xilas kir, şewq kete xençerê, çirûsî û dora serê mêvan bir û anî hejand.

21

- Dibek qeweta min kêmbibe. Erê Eyşê, hey gidî Eyşê. Dibek ji derbekê neyê kuştin, erê!

Eyşê can, eva zilamê hanî efat wê ji derba Zozana pîr bemire? Na, dibek sax bimîne, deng dinyayê belabe, îja xelq bibhê, navê Eyşê xirab bibe, Memê jî bê, seh bike, bi

engire, dil jî temûl nede, bişkê .

Xençer jî şûnda da, kire q avê .

Her dû cahil hê xewa şîrinda bûn, guleşq dibûn, lêvêd mêvan li hev diçûn û dihatin.

O, ramûsanê Eyşê, ramûsanêd bi şewat û bi agir mêvan gelekî xweş hatibûn û ew di nava xewa kibîrda ji ramûsanê wê, husil cemalê têr nebûbû, destê xwe jê nedikişand, ji sûretê Eyşa Zozanê waykirî ...

Dîsa irnê Zozanê rabûn, car din bi lez berbi çek û sîlihê wî çû got:

- Na, gerekê zû bikim, hê hişyar nebûne, ezê xewêda lêxim, eger hişyar bin, îda zefta min dere û şixulê destpêkirî, wê badîhewa here, emê undabin.

22

Zozan diha nêzîkî sîlihê mêvan bû, soranî kişand, ku here lêxe û got:

- Aqilê min ji evî dibire, eva wê sîng û berê wî xilaske û weke buhustekê jî wê di erdêda here. Deng xelqêda dernakeve, xelq se nake, soraniyê qefesa wî xilaske wê buhust ekê jî di erdêda here. Dilê Tahar me rihet nabe, navê Eyşê bela nabe, kêfa Eyşê naşkê, Memê jî naingire, dilê wî xirab nabe ... û cardin zendêd Zozanê hev şidyan û dîsa kela wê rabû,

xûna wê tevî hev bû, ewê soranî ji nav porê Eyşêra da ser sîng û berê mêvan.

Mêvan ji şewata birînê welgerya ser kêleka dinê. Zozanê diha soranî bi qewat hulkum kirê û soranî ji sîngê wî derbazî erdê bû, gihîşte doşekê û weke buhustekê jî erdêda çû.

Zozanê wî çaxî hizingek kûr rahişt û Eyşa bûk mêze kir. Eyşê wekî ji welgerandina Memê hişyar bûbû, rabû ser xwe, rûnişt û bê hemdî xwe çarnikal mêze kir, sifeta Zozanê guleşq nihêrî û hê haj lêdana Memê tunebû.

23

24

Lê xûna sor diha çarnikal girtibû. Eyşê hişê xwe bereyî ser hev kir, Memê xweyî delalî mêze kir, soranîyê ser sîng dît û her tişt femkir.

Eyşê paşê li Zozanê nihêrî û ji pêra dest avîte porê xwe, qefş kir, anî xarê, kire qîrîn û got:

- Wey Dayê, te çi serê me kir? Memê minî efat eva heft sal bû xerîbyêda bû, şer kir, nehat kuştinê, qe birîndar nebû, te çi kir? Wey dayê. Ê Zozanê jî fem kir, ku Eyşê ew Eyşê bû, wekî kolozê Memê qotgirt, Memê ku usa bê miraz ma, bi destê Zozana pîre reben hate kuştinê û Zozanê soranî ji sîngê wî hilkişand, pêlê xûnê vî alî - wî alî davîtin.

Zozan kete ser birînê, lê xûnê sifetê wê hilanî ....

Zozan îdî kûr nelya:

- Ax Memê, Memê, Memê, dya te sêwiye, dya te qijike, melûl Memê, Memê ... ax xûna kurê min bere. Ax Memê.

25

Eyşê malxirabê, min Memê bi destê xwe derdaye, heft sala çûye eskerîyê, kesî q êmiş nekir derba xwe lêde, lê hema min porkurê, min merûmê, belengazê, min delûlê, bi destî xwe derda. Erê Memê can, Memê, ax

Memê minî terî can, bê miraz. Dya te bira bibe gurê çîya, Memê. Memê, Memê, bira dinê alem seh bike, dya te dêran çî serê te û xwe anî. Dya te dêran, dêran, bira serê xwe kur ke heft dûzûna, panzde kêra, paşî Memê minî tayê tenê.

Eyşê got: - Zozana merûm, tu deng nakî, lê tu por û gulyê min kur nakî, paşî Memê, lê dilê Tahar begê lê rihet nakî.

Û wextê hêsirê wê û Zozanê çevada zahabûn, wana tabûtek Memêra çêkir, delaliyê dê, kuştîyê bi destê daykê danîn nave. Daykê tabût hilbirî danî ser milê xwe mêrxasê, nalya, kalya û rnehele- mehele gerand û tenê paşê derxist serê çîyayê j orin, tewrî bilind, li rex hêlûna teyra, çel kir, wekî ew teyr tim ji wê bilindayê dinya, çerx û

26

felekê mêze bikin. Eyşê bibînin. Wê Eyşê ku kolozê Memê heft sala got û serfinyaz xwey kir û wê dîsa xweyke, ku Memê hêrs nebe, dilê wî xirab nebe.

27

\*\*

## MIRINA TEWRATÊ

Fevzi Özmen

Zivistana vê salê li Tewvratê pir dirêj kiribû. Ji xwe hemû zivistanan lê dirêj dikirin û wê bihar bi bendan dikişand. Her tim digot: „Bixêr îsal jî bihar bihata, belkî reşebaya min bi biharê re siviktir biba.“ Lê zivistana îsalî tiştêkî din bû. Ew ne tenê bû. Ducan bû. Li aliyekî reşebayê, li aliyê din ducanbûna wê, ew lewaz kiribû. Taqet lê nemabû. Mal sar, ardû tunebû. Hele mala kirîvê Eşref carinan yek sepet sergîn nedaba wan, ew ên wê zivistanê hemû ji serman bimirana. Elîcanê teral jî nediçû, ji çolê bi piştê êzing nedianîn. Tenê kulê xwe xwar dikir, destê xwe dida paş pişta

xwe, bi kincên xwe yên qetiyayî, tî û pirçî di nav gund de wek sûtalan digeriya. Di bîst û çar saetan de tenê carekê xwarin dixwar. Bilî şîva miriyan arvanê wan jî, tunebû. Di hefteyê de carekê, rojên pêncşemiyên, çend nanên hişk, hinek toraqa tisî û carinan jî sawar û zadên din bidest diketin. Şîva miriyan têra çar canan nedikir. Zaro hûr, zaro birçî, zaro tazî û pêxas bûn. Pozê Elîcanê teral nedişewitî. Tewrat jî, nexweş û ducan... Nuha ew reşebaya dest û pêyên wê nebûya, ew ê biçûba, ji cîranan re kar bikira, lihêf bikirana, gore çêbikirana. Qet ne carinan zaro jî digirtin ji wê mala tarî ya bi rewa derdiket, diçû malên cîranan. Li malên cîranan hinek hewa digirt, xwe germ dikir. Zaroyan jî zikên xwe bi kûtan têr dikirin. Bi rasti kûtên amojina Porsor, ji yên dinan pir sortir û xweştir bûn. Wê ti caran kût nedişewitandin.

Bihar hatibû. Meha gulanê bû. Xem û xeyalên Tewratê zêdetir bûbûn. Caneke din jî di rê de bû, an îro an sibe. Rojên wê bi hejmar bûn.

Elîcan êvarê bi pirçûmê sar hat mal. Mal tarî bû. Çira vêneketibû.

„Ka va çira çima vêneketiye“ got ji Tewratê re.

„Me bi çi vêxista,“ Tewratê gote wî û domand, „ka di mala te de qazaxî hebû?“

„Erê, rast e.“ got û Elîcan ji mal derlet çû.

Piştî demekê Elîcan tevî şûşeyeke qazaxî bi şûn ve zivirî malê. Xwe bi xwe digot:

“Va kirîvê Eşref jî nebûya, wê halê me çi biba?”

Çira wan vêneketibû. Ji bo xwarinê tiştê di mal de tunebû. Elîcan çira temirand, tevî zarokan bi zikê birçî ketin nav nivînên xwe û ketin xewê. Lê xewa Tewratê nedihat. Ew ditirsiya. Ji ber ku canêşîya wê dest pê kiribû. Ji xwe ew her tim ji şevên tarî ditirsiya. Wê şevê tirs û xofa wê zêdetir bûbû. Her diçû canêşîya wê jî zêdetir dibû. Serê wê balîf nedigirt.

Carekê hewl da xwe ku rabe pê û di nav malê de bigere. Lê bi ser neket. Mal tarî û teng bû, jûniyên wê jî nedigirtin. Bê çare di nav nivînên xwe de rûnişt. Ditirsiya, diricifî û bi dengê nizim dinaliya. Her diçû nalînên wê kûrtir dibûn. Ji bo ku bi dengê bilind ew nenale û zarok hîşyar nebin, wê didanên xwe dişidand û ber xwe dida. Lê êşê mecal nedidayê. Wê dengê xwe bilind kir û naliya; “wê dayê.. wêê dayêê.. ez mirim mirim! Ez miirim miriiim!”

Dengê wê dilerîzî û kelûgirî li qirikê hatibû pêçandin. Elîcan bi dengê wê re hîşyar bû û gotê:

„Wê dayê û kul û jan! Dîsa çi ye, çi bûye? Çi dayê daya te ye? Tu nahêlî hebek xew têkeve çavên me! Hetanî kengê em ê vê qareqara te guhdarî bikin? Dayê ha dayê! Nizam dayê li ku ye? Dayê xweliya li serê xwe kir, ew ê li serê te jî bike. Oof lo! Nizam ez ji destê vêya ku de biçim! Dayê ha dayê!”

Tewratê dengê wî tew nedibihîst. Ew careke din qîriya: “Wêy ez mirim. Wîî.. ez mirim, miirim.”

Elîcan jî tevlixew bû û dikir pilepila xwe. Paşê pê werqilî ku dengê nalînên Tewratê ne wek dengê nalînên wê yên şevên berê ne. Her çiqas Tewratê ji ber êşa dest û pêyên xwe her şev digazincand, bi dengê bilind digiriya, Elîcan ji xewê hîşyar dikir, xewa wî direvand û wî dikir pilepil û niçeniça xwe jî, ew careke din diket xewê û xewa xwe didomand. Lê îşev dengê Tewratê ji dengê wê yê şevên borî cihêtir bû. Elîcên di tariyê de bîstekê guhên xwe da dengê wê. Pê bawer kir ku Tewrat bi rastî nexweş e. Wî hewl da xwe ku rabe çirê vêxe, lê bi rabûnê re; „wê bavo!” got û kir ax û of. Serê wî li maxa xênî ketibû û şkestibû.

Bi nalînên Tewratê û axîn û ofîna Elîcan re Mixdo û Xelo jî, ji xewê hîşyar bûbûn. Zaroyên reben bêyî ku ji wê rewşê tiştekê fêmbikin, dest bi girî

kirin: „Wê dayêê, wî bavooo..!“ Li aliyekî nalînên Tewratê, li aliyekî qîrîna Mixdo û Xelo, li aliyê din axîn û ofîna Elîcan; tevliheviyeke nefambar pêk anîbû.

Elîcên, ji ber dengê giriyê zaroyan û nalînên Tewratê êşa serê xwe ji bîr kiribû. Di tariyê de li çîrê digeriya. Wî çîra dît, ew vexist. Pişt re çû ba Tewratê li rûyê wê nerî ku reng û gwînê Tewratê çûye. Ew di nav kel û xwîdanê de maye. Lêv lê ziwa bûne û mijikê avitiye dora lêvên wê. Wê demê Elîcan jê tirsîya. Ew ji wan gotinên xwe yên ku ji Tewratê re gotibûn, poşman bû. Hedîka çû cem zaroyan û gote wan:

“Kurên min, netirsîn, tiştêk tune! Êşa diya we dest pêkiriye. Bîstekê bi şûn ve ew ê derbaz bibe.”

Di vê navberê de wî destê xwe bir serê xwe û bi şûn ve kişand. Destê wî şil bûbû, ji xwînê sor dikir. Serê wî şikiyabû. Xwîn herîkibû ser stûkura wî. Stûkura kirasê wî yê spî yê qirêj di xwînê de mabû. Lê zaro hêj aş nebûbûn. Nalîn û qîrîna Tewratê jî her diçû kûrtir dibû. Elîcan, li aliyekê xwîna serê xwe paqij dikir, li aliyê din diqîriya ser zaroyan û Tewratê. Dixwest ku wan aş bike. Lê ne zaro aş dibûn, ne jî Tewrat ditewiya. Vê tevliheviya ha gelekî domand.

Piştî aşbûna zaroyan, Elîcan çû ba Tewratê, li ber serê wê rûnişt û destê xwe da ser eniya wê. Xwidaneke sar jê diçû. Elîcan çû tasek av anî dayê, wê qultek jê vexwar. Di malê de bêdengî hebû. Ji nişka ve dîsa qêrinek ji Tewratê hat. Elîcan hilciniqî. Zaroyan dîsa deng bi girî kirin. Tewratê got:

“Hey marûmo, Rabe biçê gazî xaltiya Seyranê bike! Tu çî li ber serê min rûniştîyî? Tu ji halê min çî fêm dikî?”

Tewrat ketibû ber êşikan.

Elîcan hema fêm kir, hewl da xwe ku rabe biçe gazî meta Seyro bikê, êşa serê wî ket bîrê. Xwe xûz kir. Bêyî ku carek din serê xwe li maxa xênî bixe, ber bi derî ve çû.

Xaniyê wî yê yekçavî, wek pûnika mirîşkan nizm û tarî bû. Bi rojnigeke piçûk ji banê ronahî digirt. Diwarên wî yê yek di bin sergoyê ku havîn û ziwistanan wargeha ker û mirîşkan bû, da dima. Bayê jêrîn toz û xebara sergo hetanî hundirê xênî dianî. Gava ku mirov ji der ve biketa wî xaniyê tarî, bêhna tirşiya rewayê çavên mirov dişewitand. Deriyekî şirt î bi heriyê sewaxkirî li ber bû. Bana wî bi axê hatibû nixumandin. Sê diwarên wî di erdê de bûn. Tenê dîwarekî wî î bêsewax ku li başûr mêzedikir, dihat xûyakirin. Diwarên hundir jî, bê sewax bûn. Tendûreke biçûk di xênî de hebû. Ew jî, havînan di hefteyê de carekê, zivistanan jî, zêdetirîn sê caran dihat dadan. Dûyê wê arixa xênî û gont û martakên wî di quruma reş de hiştibûn. Du qat nivînên kevnên zirziliyên qilêr ên ku bi qîrika biharê lewitî bûn, di kuncikê xênî de didan serhev.

Saet hatibû nivê şevê. Elîcan derî vekir û stûyê xwe dirêjî der kir. Berî ku gava xwe bavêje wîyalî şêmûkê, li ezman nêrî. Ezman tarî, stêrk tunebûn. Mirov nikaribû gavekî ji xwe wêde tişteki bidîta. Carinan ewr digurmîcîn û brûskê vedida. Dil hebû baranê dest pê bikira. Elîcan hedîka gava xwe avêt wî alliyê şêmûgê, lingê wî yê yek çikî nav heriyê bû. Hewl da xwe ku lingê xwe bi şûn ve bikişîne, tewiştî, lingê wî yê din jî ket nav heriyê û tê de çik bû. Hewleke din da xwe ku xwe ji nav heriyê bifilitine, lê mêzina xwe winda kir û li ser dev û rûyan çû erdê. Îcarê bi herdû lepên xwe ket nav heriyê. Bi hêza destan xwe bi şûn ve kişand. Herdû pêlavên wî yên qetiyayî jî, di heriyê de man. Xwarî erdê bû, di tariyê de bi lepan li pêlavên xwe geriya û ew dîtîn. Heriya hundirê pêlavên xwe yên lastîk, bi destê xwe paqij kir û ew carek din kirin pê. Êdî tiştta ku diviyabû biba, bûbû. Elîcan tevî pêlav û gorên xwe yên biherî yên şil da nava heriyê û berbi



mala meta Seyro ve bibalkêşi hedî hedî meşîya. Lê serê wî jan dida. Destê xwe avêt telikê xwe ku ji serê xwe derbixe. Telik, bi porê wî ve zeliqî bû. Wî telik kaş kir, ji serê xwe deranî. Bi destê xwe yê bi herî ji bêrika şalê xwe destmala xwe ya qilêr a ku ji mehekê zedetir û pê ve bû nehatibû şûştin, deranî û xwest ku pê destên xwe yên bi herî û serê xwe yê bi xwîn paqij bike. Lê xwîn cemidîbû û kesek girêdabû. Bi destên xwe çend kesekên xwînê ji porê xwe derxist û avêtin erdê. Piştî careke din destmala xwe ya qilêr qat kir û xist bêrika şalê xwe.

Elîcan di tariyê de dimeşîya. Baranê dest pêkiribû. Ewr digurmîcîn, brûskê vedida. Wî pêşîya xwe nedidît. Brûskê jî, hetika wî biribû. Piştî vedana brûskê bi qasî çend deqan çavên wî ti tiştê nedidît. Tirsawî ji kendalê alî wî yê rastê ku çem di ber re diherikî, hebû. Heke lingên wî bişemitiyana, ew ê di kendal de gêr biba û biçûba ji kîsê heftê û heft bavên xwe.

Şev tarî bû, şev bêdeng bû, rê bi herî bû, baran dibariya, jinik tevî zaroyan di mal de tenê û nexweş bû. Xofekê Elîcan girt. Di dilê xwe de got: “Lê bimire!”

Şev ker bû. Tenê dengê çem bêdengiya şevê diçirand. Wê şevê dengê çem him zêdetir bû him jî, pir xerîb bû. Disa wî di dilê xwe de digot: “Gelo tu bê laser rabe? Ku ew rabe, ew ê pirê bide ber xwe û bibe. Ku laser pirê bibe, wê meta Seyro di vê şeva tariya bibaran de çawa karibe çem derbas bike? Îşelah ew ê laser ranebe!”

Elîcên hewl dida ku bistekê zûtir xwe bigihêjîne mala meta Seyro. Lê heriyê mecal nedidayê. Hêj pire jî, li pêşiyê bû. Dîsa ket nav xeyalan. Tewrat û zarok ketin bîrê. Xortaniya wî û qîzaniya Tewratê hat bîrê. “Tewrat keçikeke çiqas bedew e jêhatî bû” di dilê xwe de derbaz kir. “Hetanî berî çend salan wê serbêrî dikir. Rojê du danan her carekê dikaribû bi serê çarsed-pêncsed pezî bigirta. Di bêriyê de bi stûyê peza her bêrîvanekê digirt û dida ber wan. Lê îro! Îro jî bindest bûye. Mirata

reşebayê ew çiqas lewaz kiriye. Ji me kêmtir îcar zarokek din mabû. Ma qey me ew ên hene baş xwedî kirine, îcarê maye evê nû.”

Elîcên di dilê xwe de ji Xwedê jî gazine kir û got: „Xwedêyo! Tu mezin î. Hêza te ji her hêzê pirtir e. Tu her tiştî dibînî û dibihîzî. Tu her tiştî dizanî. Li her derê hazir û nazir î. Ma Tu halê me nabînî? Ez ji herkesî zêdetir dixebitim. Rojê pênc caran ji te re nimêj dikim. Rojîya remezanê qet naxwim. Pir caran serê sê mehan, şeşek û dehekên heciyan jî digrim. Rojê bi hezar caran navê te bi bîr tînim. Dîsa jî birçî me! Di gencîneya te de her tişt heye. Ma tu nikarî bi qasî têra me debara me bidî me? Heke gunehê te bi min û Tewratê nayê jî, bila bi zaroyan were! Zaro tî, birçî û pêxas in. Ma ev edalet e?” Lê ew di cî de ji van gotinên xwe poşman bû. “Tobe! Tobe!” got. “Ez çawa dikarim têkilî karê Xwedê bibim. Ma ev yek fermana Xwedê ye. Ji destê me çî tê!” Û meşîya...

Hatibû nêzîkî pirê. Bi zorê karibû pêşîya xwe bidîta. Ji ber baranê ew pir şil bûbû. Ji kincê wî av diniqitî. Lê wî gazine ji vê rewşê nedikir. Hişê wî li mal mabû. “Lê tewrat bimore!..”

Diviya bû ew ji Newala Bitirs derbaz biba. Hemû gundî bişev ji vê newalê ditirsiyan. Digotin tiştine xirab di vê newalê de hene. Lewma navê wê lê kiribûn “Newala Bitirs”. Elîcan jî, ji vê newalê ditirsiya. Lê çare nîn bû, çî dibû bila biba, diviyabû ew wê şevê di wê newalê re derbas biba.

Hedî hedî berbi newalê ve dimeşîya. Dîsa Tewrat ket bîrê. “Nizam min ji Tewratê çî dixwest? Tawana wê çî bû? Çî xeta heye di xênî de ye. Ji xwe Tewratê ev îleta xwe ji vî xaniyê bêhewa û birewa girt. Di qîzaniya xwe de ew gelek çalak û jêhatîbû. Lê Îro?..”

Elîcên hinek din nêzîkî li Newalê kiribû. Mixdo ket bîrê. Mixdo hê çar salî bû. Zikê wî yê ji ber kurman perçifî yê weke zebeşên Amedê gir, hetanî ber qevsinga wî bilind bû. Bi çavên xwe yê bi şîlaq bi tirs li mirovan

dinêrî. Zivistanan bi tena kiraseke kevin, serqot û pêxas derdiket ber derî û di nav berfê de wisa digeriya. Carinan jî ji xênî dûr diket. Diket nav şepiyên berfê û tê de çik dibû. Cîranên ku di ber re derbas dibûn, destê xwe diavêtin milên wî yên zirav ji nav berfê derdixistin û dibirin mala wan. Lê Mixdo ti qet talaş nedikir.

Havînan tazî şilfê canê xwe bû. Li ber derî di nav toz û xebarê de rûdinişt. Lîlika pozê xwe an bi zimanê xwe paqij dikir an jî, bi piştê destê xwe li rûyê xwe dida. Toraq û mastê ku havînan cîranan didanê, bi tena serê xwe nedixwar. Her tim curbicur mêhvanên wî hebûn. Yên yekem mêş, yên duyem mirîşk bûn. Carinan jî, se dihatin mêhvandariya Mixdo. Mêş li ser porê wî yê qurîşkê qilêrê bi rûn û li dor dev û pozê wî yê bi mast û lîlik dihêwirîn. Wan ji hev pir hez dikirin. Ew wek heval bûn. Hemû mêşên gund Mixdo nas dikirin. Dihatin serdana wî û li laşên wî dihêwirîn. Laşê Mixdo hêwirgeha mêşan bû. Ne ji wan xû dikir ne jî, ew ji xwe dûr dixistin. Lê tama Mixdo ji destê dîkê mala mele û cewrikê apê Egît qet tunebû. Nan û kutên ku cîranan dida Mixdo, an dîk an jî, cewrik dihat ji dest Mixdo direvandin.

Roja Mixdo ji dayîka xwe bûbû, Elîcan zaf pê şa bûbû. Wî digot: “Ji mêran kurên mêr dikevin. Ew ê rabe sûlala me bidomîne. Ew ê wek kalikê min ê Mixdat bibe mêrxasek.” Û navê kalikê xwe lê kiribû. Elîcan di vê dawiyê de ji wan gotinên xwe poşman bûbû. Tawan davêt ser Tewratê û digot: „De here lo! Kê dîtiye ji dêla tirek seyên gurê bikevin. Tu li dê binêre û mêraniya Mixdo bihesibîne.”

Elican her tim reşebaya Tewratê dikir serhevde û dida rûyê wê: “Tu çi bûyî ku dewlê te bibin çî” digotê.

Her çiqas Xelo dû salî bû jî, ew ji hemêza diya xwe dernediket. Hêj li ber pêşîran bû. Pirsgirêkên Xelo wek yên Mixdo zêde nebûn.

Elîcan pê ferqilî ku hatiye ber Newala Bitirs. Ava newalê rabûbû. Bi balkêşî di ser pêpanikan re derbas dibû. Bismîlahî digot û tiffî dora xwe dikir. Di dilê xwe de jî digot: “Lê Tewrat bimire!.. Hey kevir li devê te keto! Devê xwe ji xêrê re veke!..”

Êdi hatibû ser pêpanika dawiyê. Dema ku cindik da xwe û xwe avêt wiyalî newalê, pê re li tiştê ket. Dengeke wisa ecêb ji tiştê terket ku porê serê Elican gij bû, ziravê wî qetiya, zimanê wî hat girtin. Ew çi bû gelo? Tiştê xirab bû, çi? Elîcan viyana xwe winda kir û xeriqî.

Dema ku Elîcan bixwe hat, wî nizanibû dem çiqas derbas bûye. Di nav avê de bû. Cemidî bû, diricifî. Çeqeçeqa didanên wî bûn. Pir tirsîya bû. Çi bûbû, çi lê qewimîbû, pê nizanîbû. Ziman lê nedigeriya. Bi dengê banga dîkekî re bi xwe ferqilî. Dest pêkir û xwe bi xwe axifî. Di eslê xwe de nedixifî. Dikir miremir û bixebix. Zimanê wî bi paş û pêşî hev diket. Di dawiyê de çend pêyvên ku wî jî jê fêhm nedikir, ji dev derket. “Mme, mmee, mmet.. meetaa Seeyraan Tiştên xirab Xirab.. Tewrat..”

Li ser lepan xwe kişand, ji nav avê derket. Hedî hedî sibe ronî dibû. Baran jî rawestiyabû. Elîcan xwest ku bîstekê li serpişt ramede û bila hişê wî were sêrî. Dema ku wî serê xwe ji paş ve danî, serê wî çû li tiştê nerm ket û kastinek pir bi robê hat guhên wî, ji tirsan mîna ku çend mirov bi hev re Elîcên ji ciyê wî rakin û disa berjêr bavên nav ava newalê, wî carek din xwe di nav ava newalê de, li ser dev û rûyan dît. Dev û didanên wî tijî xwîn bûbûn. Pir şerpeze bûbû, lê îcarê nexeriqî bû. Diricifî. Demeke dirêj bêyî ku xwe bilivîne, di ciyê xwe de ma. Paşê hişê wî hat serî. Sibe ronî bûbû. Wî xwest ku neyarê xwe nasbike ka ew çi ye. Xwe bi erdê ve kişand hat cem neyarê xwe ku çi bibîne. Ew tiştê ku ji nivê şevê de ziravê wî qetandibû, Berazê mala xalê Wahab bû. “Wêy mêrato!” got, “çima te îşev ez qetandim! Hele hûn li halê min û vî mêratî binêrin!”

Di ciyê xwe yê rûniştî de, xîçek kevir ji nav avê girt ku pê ve wer bike, lê kevir bi Beraz havil nekir. Ji xwe vî jî nikaribû kevirê duyem bigre û bavêjiyê.

Elîcan hewl da xwe ku rabe pê. Lê taqet tê de nemabû. Dilolicî û diricifî. Kinc û kolên wî him şil bûbûn him jî, di heriyê de lewitîbûn. Destên wî û devdora devê wî di xwîn û heriyê de mewicîbûn. Xwest ku wan bişo, lê ava newalê tevahî lix û herî bû. Berê xwe da çem. Ava çem jî, şêlû bû lê wek ya newalê nebû. Bizerê xwe gihand ber çem, hat tûncikan, destê xwe şuştin û kulmek av avêt devê xwe. Bêhna herî û reşikê jê dihat. Dilê wî jê li hev ket, tiffî erdê kir û xwe bi xwe got: “Mêratê, çi tameke berbat jê tê”. Bê dil kulmek ava din jî girt, pê devdora devê xwe ji xwînê û heriyê şuşt. Bi çend kulm ava din jî şalê xwe û pî û pêşên çakêtê xwe şuşt. Wî çiqas ew dişuştin, her diçû ew di heriyê de dimeliqîn. Rabû ser xwe, ji jor ve li kincên xwe nêrî; “Ji berê xirabtir e” got û berê xwe da pirê.

Dema ku di ser pira ji du darên spîndar ên stûr û dirêj pêkhatî, re derbaz dibû, ji tirsan û sermayê jûniyên wî dilerizîn bi xwe jî diricifî û dilolicî.

Çû ber derê meta Seyranê. Êdî sibe tê ronî bûbû. Pişkên şiliyê davêtin. Dil hebû baran dîsa dest pêbikira. Elîcan serê xwe rakir, li ewran mêze kir. Ewrên reş ên bi hêrs û kerb, ber bi başûr ve direviyan. Di dilê xwe de: “Hele li van mêratan binêr! Mirov dibê qey gazî li pê ne. Tobe, tobe...” got û bi girmika xwe li derê mala meta Seyro xist. Piştê bi dengê bêhêz î westiyayî bangî meta Seyran kir:

“Meta Seyran, meta Seyraan! Hûn hişyar in, an na?”

Ji hundir deng derneket. Carek din bi kulmên xwe yên bêhêz li derî xist, bi dengê xwe yê lerizî û tevligirî bang kir.

„Meta Seyraaan, meta Seyrooo...! Hûn hişyar in, an na?”

Dengê mêran î stûr î xizok ji hundir hat.

„Çi ye loo? Çi tawa ye?” got û kuxik li qirêkê piçikî. “Tu kî yî? Uhuu uhuuuu.. vê sibê zû,..uhuuu uhuuu, tu ji me çi dixwazî lo?”

Elîcan dengê Xalê Misto nas kir.

„Xalo ez im, ez! Ez Elîcan im! Ca xêra bavê xwe derî veke! Ez hatime ji bo meta Seyran. Rûyê min li ber te reş e, zaroyên me di ber tengiyê de ne. Bila meta Seyran were jê re dapîriyê bike! Zû, zû! Ew pir nexweş e!”

Di hûndir de miremir û kuxekuxa Xalê Misto bû. Elîcan dengê wî seh nedikir ku ew çi dibêje. Paşê dengê meta Seyro bi ser wî ket.

“Elîcanê min, çi bûyê? Kurê min, te got Tewrat nexweş e?”

„Erê erê Metê! Zû bike zû! Ew pir nexweş e!” gotê.

Di vê navberê de Xalê Misto jî, derî vekiribû. Gava ku çavên Xalê Misto li Elîcan û li vî halê wî yê şerpeze û belengaz ket, bi rastî qijiniyek bi dilê wî ket û gote wî:

„Way li min mal xirabî! Kuro çi bûye bi te? Va çi hal e hatiye serê te? Kê li te xistiye?”

“Xalo qet qal neke, kesekî li min nexistiye! Lê ya ku îşev ji êvar de hatiye serê min, bila neyê serê kevir û daran, bila neyê serê gurên serê çîyan! Destê te maç dikim! Li min bibore! Me ava rûyê xwe carekê rijandiye! Biraza te nexweş e. Ez ji êvar de, ji mal derketime. Edî miriye, maye, ez nizamim!”

Xalê Misto ne ji Elîcan ne jî ji gotonên wî tiştek fêhm kiribû. Tenê serê xwe dihecand û dikir niçeniça xwe.

Meta Seyran jî hatibû ber dêrî. Wê jî, li halê Elîcan nêrî û dilê wê pê şewitî. Meta Seyranê serê xwe rakir, li ewr û ezmanan nêrî. Rewşa ewr û ezman ti ne rewş bû. Pirçûmê meta Seyran tiriş bûbû.

„Di vê şilî û heriyê de em ê çawa karibin biçin, Kurê min? Min taqet nîne. Çavên min ji min nabire ku di vê hewayê de ez werim“ gote wî.

Elîcan xwar bû, bi destên xwe yên ku di herî û xwînê de mabûn, rahişt destê meta Seyran û bi dengekî dilşewat û lertzok gote wê:

„Na na! Were, were metê! Tewrat pir nexweş e! Divê tu werî! Ez te pişt dikim. Ku tu werî pišta min, tu di heriyê de namînî.“

Bê çare meta Seyro razî bû. Lê Xalê Misto hêrsa xwe anî û qîriya:

“Kuro tu nikarî li ser pêyan bisekinî. Tu çawa dikarî Seyro li pişt bikî? Hespekî an jî tişteki bibîne, bila Seyro lê siwarbe were.

Elîcan:

“Na, na xalo! Ez di vê sira misteqîm de hespan ji ku bînim? Tu dizanî hêspên ciranan gişk li serê çiyê ne. Tenê hespê mixtar di tewlê de ye. Ji xwe ew jî, nade.”

Dilê meta Seyro bi vê rewşa Elîcan şewitî û ji bo çûyînê razî bû. Elîcan ew pişt kir. Mala wê ji pirê pir dûr nebû. Her çiqas meta Seyran sivik bû jî, lê Elîcan hetanî ew anî ber pirê cermê eniya wî qetiya. Elîcan li pirê nêrî. Darên pirê pişkekê ji erdê bilindtir bûn. Di dilê xwe de got; “Ya Ellah” û gava xwe avêt. Lingê wî yê paşiyê pişkekê şemitî, lê Elîcan xwe ragirt, neket erdê. Gavekê du gavan bi şûn ve hat. Carek din hewl da ku pirê derbaz bike. Îcarê lingê wî yê çepê ku şil bûbû, di hundirê solê de şemitî, Elîcan mêzina xwe winda kir û tewişî li erdê ket. Cihê wan jî pişkekê kaş bû. Herdû di ser hev de gindirîn. Bi qîrîn û gazina meta Seyro û axîn û ofîna Elîcan re, herdû hetanî nav ava çem gilêr bûn. Şansê wan bû, çiyê ku ew ketinê pir kûr nebû. Di nav avê de bû bixebixa wan. Elîcan hetanî têde hebû hewl da xwe, hêza xwe tov kir, destê xwe avêt serê Meta Seyro ku serpişt ketibû nav avê, bixebixa wê bû û hinek mabû bixendiya, rakir û bi dengeke lewaz î tevgirî bang kir:

„Hewar e, hewar e gundînooo! werin, alîkariya me bikin, em dixendiqin!“  
Dengê wî çû Gulehmedê biraziyê meta Seyro ku rabûbû nimêja sibê.  
Gulehmed, bi tena kiras û derpê bazda, çû gaziya wan. Ew ji nav avê derxistin.

Deng ji meta Seyro dervediket û ti damareke canê wê nediliviya.  
Gulehmed ew di nav heriyê de, li ser dev û rûyan dirêj kir. Piştî wê mist da, tanek dudu lê xist. Hêdî hêdî xûzin bi meta Seyranê ket û ew bixwe hat. Bêyî ku dengê xwe bike li çavên Elîcên û Gulehmedî mêze dikir.

„Metirse metê metirse, her tişt derbaz bû!“ gotê Gulehmed.

Gulehmed bi awayeke şaşmayî, vegeriya li Elîcan nerî û pirsî:

“Kuro lawo çî bûye, çî qewimiye? Hûn di vê qiyametê de li çî digerin? Tu vê jinika pîr a nexweşa feqîr ku da dibî?”

Elîcan:

“Kekê Gulehmed, Tewrat, Tewrat nexweş e. Di ber tengiyê de ye. Zû bike, divê em biçin xwe bigihêjîninê! Ditirsim ku ew miribe!”

Gulehmed jî fêhm kir ku jina Elîcan di ber êşikan de ye. Bêyî ku tiştê din bipirse an bibêje wî meta Seyran a ku pejmûrde bûbû, avêt ser piştî xwe û da rê. Elîcên jî, bi halê xwe yê şerpeze da dûv wan.

Hatin ber derî, ketin hundir. Mala Elîcên bêdeng û tarîbû. Gulehmedî derî vekirî hîşt.

„Çira we li ku derê ye?“ ji Elîcên pirsî.

Elîcên ciyê çirê şanî dayê. Wî çira vexist. Vîzinek ji nav nivînên Tewratê dihat. Gulehmedî ji meta Seyran a ku hişê wê hatibû serî, re got:

„Metê, ew vîzina dergûşê ye, ji bin lahêfê tê. Ca li wir binêre.“

Meta Seyro berbi nivîna tevratê ve çû. Lihêf rakir. Dergûş di nav rûvê de bû. Pir nemabû ku bixendiqe. Wê dergûş ji nav rûvê derxist. Ji Elîcên û



Gulehmedî kêr xwest ku navika dergûşê bibire. Meta Seyro li aliyekê navika derkuşê bi qotê tirpaneke kevin dibirî, li aliyê din li çavên Tewratê yên vekirî yên ku bi hêvî li derî mêzedikir, dinêrî. Bangî wê kir;

„Tewrat, Tewrat!“ gotê.

Lê deng ji Tewratê derneket. Piştî Elîcên û Gulehmedî bi wan de bû. Meta Seyro;

„Şukur, şukur dergûş xweş e!“ got.

Tewrat bê deng bû. Êdî nedinaliya. Birînên wê jî nedişiyên.

Deng ji Mixdo û Xelo jî, dervediket. Herdû li hev piçikî bûn. Ditirsiyan û diricifîn. Bêyî ku deng bikin li diya xwe dinêrin. Tewratê jî, li derî. Elîcan û Gulehmed jî, bêdeng bûn. Elîcên serê xwe kir nav herdû destên xwe û hat ser jûniyan. Lêvên wî dilerîzin. Girî li gewriyê piçikîbû, lê nikaribû bigiriya. Dimenê çend deqîqan domand. Piştî Elîcan, bi dengê lewaz î stemkar: „Xwedêyo! Gunehên min çi bû, te ez tevî sê sêwiyan di vî pûçê xênî de hiştim. Ez van sêwiyan çawa xwedî bikim? Peryê kefen ji ku bînim?..“

Ji bilî giriyan Şukrî(!), bêdengiyêke dilkovan ketibû xênî...

Fevzi Özmen

Siyên Şikestî

Weşanên Pêrî-Stenbol, 2005

\*\*

## MÎRZAYÊ BIÇÛK

Antoine de Saint-Exupéiy

MÎRZAYÊ BIÇÛK

Antoine de Saint-Exupéiy

Wergera ji fransî: Fawaz Husên

Weşanên NÛDEM

Weîanên NÛDEM: 19

Mînayê Biçûk

Çapa yekem: Stodholm 1995

Traduit en kurde par

FawazHUSSAIN.

D Editions Gallimard, 1946. pour le texte original

©Editrans Nûdem, 199J, pour le texte kurde

Pergala berg û lûpelan: NÛDEM

Wêneya bergê: Antoine de Saint-Exupdry

ISBN: 91-88592-19 7

Navnîjan:

Termov. J2, 2tr.

77 175Jaifilla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

Ez vê wetgerê diyarî Esthêr, Stêra xwe, keça xwe dikim.

FawazHusên

Berhemên Antoine de SAINT-EXUPÊRY

Nameyên Başûrê (1928(

Fira bi şevê (1931(

Erda Mirovan (1939(

Balafirvanê Cengê (1942(

Mîrzayê Biçûk

)Ligel nigarên nivîskar) (1943(

Nameyek ji Girtiyekî re (1943(

Kelehdiz (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1948(

Nameyên Xortaniyê ji hevaleke xeyalî re û

Defterçe (1936-1944). (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1953)  
Nameyine ji bo diya wî (Çapbûyî piştî mirina nivîskar,  
(1955

Meneyek ji bo jiyane (Çapbûyî piştî mirina nivîskar, 1956)  
Antoine de SAINT-EXUPÉRY  
(1900-1944)

Antoine de SAINT-EXUPÉRY li bajarê Lyonê di 29'ê meha şêşan de ji sala  
'1900'ê ji diya xwe dibe. Di çarsaliya xwe de, Antoine bavê xwe winda dike  
û sêwê dimîne. Lê rewşa malbata Saint-Exupdry xweş e û ligel mirina vî  
bavî, Antoine û zarokên din bi diya xwe re biçûkaniyeke xweş dibînin.

Di sala 1909'an de diya wî li Mansê bi cih dibe û Antoine ii wê derê diçe  
dibistanê. Ev salên xwendin û zaroktiyê ciyekî mezin di nav bîranînan wî  
de digirin. Antoine wê pajê binivîsîne ku li ser her masê ji masên  
dibistanê,

wî hinek ji wê dilovaniya zaroktiya xwe hiştiye.

Di sala 1912 ew çav li balafirekê dikeve, dibîne çawa ew bi asamanan  
dikeve.

Ji wê gavê, daxwaza firîna di hinava wî de ciyekî mezin digre û gava  
yê balafirvan têdigihêje ku ew zarok pir dixwaze \i balafirê siwar bibe, ew  
daxwaza dilê wî bi gewde dike û wiio jî, ji bo cara yekemîn di  
duwanzdehsaliya

xwe de, Antoine hîsên xweşî û azadiyê nas dike. Ev bûyera hanê şûna  
xwe di dilê Antoinê zarok de çêdike û firîn ji wê rojê jê re dibe mebest  
û armanc.

Di destpêka Cenga Cîhanî ya yekemîn de, Antoine û birayê xwe François  
derin bajarê Frîbourgê li Swîsê û xwendina xwe U wê derê berdidomînin.  
François bi nexweşiya dil dimire û Antoine gelekî li ber mirina vî lawikê  
panzdehsalî dikeve. Ew xwendina xwe ya navîn tev dike û tê Pairsê.

Ew di beşên zaniyariyê û nemaze di matematîkê de xurt e lê belê di nivîsandina

salixdanan de hineld qels e. Ew di xwendina xwe de bi ser nakeve û sala 1919'an ew li zanîngehê dikeve bejê Hunerên Xweşik.

Di sala 1921<sup>^</sup> de, ew ieşkeriya xwe dike, dibe hostê balafiran. Ew peran ji

diya xwe dixwaze û hînî ajorina balafirên medenî dibe û dîploma xwe ya balafirvaniyê digre. Lê rêya firê hêna li ber wî dirêj e. Piştî çend salan, ew U

bajarê Toulousê di kargeha balafiran de kar dike. Di 1927'an de xewna wî ya kevin û şîrîn bi gewde dibe. Ew bi balafirê nameyan ji Toulousê dibe Kazablankayê, li Afi-îqa bakur û, ji wê derê jî, di ser Sehrayê re, ew wan digihîne

bajarê Dakarê. Ew di sala 1928'an de navê ku U ser kîsên postexanê Nameyên Bajûrê U romana xwe ya pêşîn dike. Ew di vê pirtûkê de U ser jiyana

û zehmeriyên balafirvanan dinivîse. Weşanxane gelekî kêfa xwe ji vê romanê re diyar dike û ji Antoine de Saint-Exup<sup>^</sup>ry dixwaze ku ew ji bo wê heft romanên din binivîse. Ev peyman a pîrozwer rişteki mezin di jiyana

Antoinê balafiran de naguherîne ji ber ku ew her karê xwe, wek berê, berdewam dike. Ew bi balafira xwe rêya Europa û Argendnayê vedike. Ew romana xwe ya duduyan Fira bi şevê di sala 1931'ê de çap dike û mara xwe

U jineke argentînî dibire. Nivîsên Antoine de Saint- Exupdry deng didin û Erda Mirovan (1939) Xelata Mezin ya Akademiya Fransî digire.

Cenga Cîhanî ya duyemîn dest pê dike û Antoine de Saint-Exup<sup>^</sup>ry gelekî U ber şikestina Fransayê dikeve. Ew xwe digihîne Amerîkayê û li wê

derê, Balafirvanê Cengê û Nameyek ji bo girtîyekt dinivîsîne. Ew çîroka Mîrzayê Biçûk U Nû Yorkê di sala 1943an de dide çap kirin û pajê berê xwe dide Cezayirê. Ew xwe digihîne hevalên xwe ên balafirvanîyê. Ew anuha çel û sê salî ye û temenê herî mezin ji bo ajorina balafiran bi xwe sî û pênc e. Lê bi saya dost û nasan, ew balafirê dajo. Di 31 meha heftan de ji sala 1944 şopa wî di fira nehan de bi gişd winda dibe û kesek nizane balafira wî U kuderê dikeve.

Tiştê ku ji van pirtûkan xuya dibe ew e ku Antoine de Saint-Exupdry hemû berhemên xwe U ser jiyana balafir û balevirvaniyê, angû U ser jiyana xwe ya kesane û rojane, ava dike. Antoinê nivîskar zora Antoinê balafirvan nabe. Ew bûyeran di kirasekî edebî de rêz dike û di nav van rêzan de peyxamekê digihîne xwendevanan, moralekê, suncekê bi gewde dike. Nivîskar pesnê tevgerê, jiyana mirovan dide. Ew dibêje ku tenê tevger û berxwedan dihêlin ku meneyek ji jiyane re çêbibe. Gava mirov xwe ji can û dil dide kar û barên xwe, ew rixûbên mirinê her gav dîr dixîne û rêya bexteweriyê fireh dike. Di xwêdan û daxwazên mirovan de meneyek ji jiyane re çêdibe. Fransa rûmeteke mezin dide Antoine de Saint-Exupéry. Ji bo bîranîna pêncîsaliya mirina wî, banka fransî wêneya nivîskar û nigara Mîrzayê Biçûk U ser kaxeza pêncî fi-angî dixîne.

Pirtûka Mîrzayê Biçûk di nav berhemên Antoine de Saint-Exupéry de bi rasd ciyekî taybed digre. Ew bi babet û naveroka xwe ji hemû pirtûkên

din cihê ye. Ji navên pinûkên din mirov dikare bizanibe ew U dora çi mijaran

digerin. Eger ceng û serêşên jiyane ciyekî mezin di nav wran de dibînin, pirtûka Mîrzayê Biçûk dhanekê bi serê xwe ye, berhemekê yekta ye.

Ew di nav serdemên harbûyîne de xewneke xweş e, di nav sedsalên dijminariyê

de bîstikek dilovanî ye.

Di jiyana xwe ya kurt de, Antoine de Saint-Exup<sup>^</sup>ry di nav herdu cengên cîhanî de derbas dibe. Ew tenê di zarokriya xwe de demên kêfîcwqî û pakiyê dibîne. Gava ew "mezin" dibe, ew bêgav dibe bikeve nav cengê û bi "Mirovên mezin" re pêwendiyên çêbike, bijî. Di vê jiyana dorgird de, xewn rêya xeiasê di rûyê wî de vedike, xewna xweş her gav bang wî dike. Wilo jî gava bayê hoviriyê gûr dibe û xwînxwar U bajarên Europayê U laşan

digerin, Antoine di serê xwe de dûrî navendên bajarvaniyê, dûrî cengê dikeve. Ew U balafira xewnan siwar dibe, diçe Biyabanê, diçe Sehraya Afrîqayê

û U wê tenhariyê, wek piraniya pêxemberan, tiştên ku bi çavan nayên dîrin ew wan bi dilê xwe dibîne. Li wê derê ew pêrgî mîrzayekî biçûk tê û herdu, bi hev re, U rasriya riştan digerin û aveke ne wek hemû avan vedixwin:

ew U bîra dilovaniyê digerin û wê di bilindbûna hîsên pak de peyda dikin. Antoine de Saint-Exup<sup>^</sup>ry dûrî Fransa şikesd, U Amerîkayê, tevnê vê xewnê kok dike. Ew bi vê berhemê, angê bi vê xewnê, salên reş U paş xwe dihêle û xwe davêje nav pêlên demên zarokdyê. Dûrî "Mirovên mezin"

ên tenê ji rijtên vala hez dikin, ew hînî jiyana rasdn dibe, xwe di kirar

sê mîrzayê biçûk de nas dike. Balafirvan û nivîskar bi saya vê xewnê, bi alîkariya

vê dikenikiyê, dikarin herdu xwe bigihînin warê hêviyê. Xewnên rojane dikarin deriyê jiyanêke sade li ber wî vekin. Antoine de Saint-Exupéry

di baweriya min de dixwaze bêje ku her kes dikare U balafira xwe ya xewnan siwar bibe û pêrgî mîrzayekî biçûk bibe, her kes dikare v^ere dilpakiya

zarokriyê û hîsên xêrxwaziyê.

Eger ez ne şaş bim jî, peyxama Antoine de Saint-Exupdry di vê pirtûka biçûk de ê tişteld wilo be. Xwendevan dikarin bi gelek şêweyan vê pirtûka hanê bixwînin. Lê belê eger zarok dikarin bi gelek hêsanî têbigihêjin, ew ê

ji bo "mezinan" gelekî zehmet be. Kûranî bi çavên mezinan hariye û ta ku ew bikaribin vê pirtûkê bixwînin, gerek pêşî ew U dilpakiya zarokriya xwe bigerin. Ew dikarin wek mîrzayê biçûk û nivîskar xwe hîn bikin çawa riştên ku bi çavan nayên dîrin bi dilê xwe bibînin. Wilo jî ev pirtûka xweş di serdemên dbûnê de wê bibe tasek ava hênîk, di birçîbûnê de gepek nanê germ û di rojên tengezariyê de awazek xweş û dilnijîn.

Eger kêmasiyên vê wergerê hebin, -û bêguman wê hebin,- ez bexşîn û lêbihurînê ji xwendevanên biçûk û mezin dixwazim. Min ev berhem bi kelecane wergerand ji ber ku min xwest ez zû reşbeleka evîn û lêbihurînê ya

di serpêhariya mîrzayê biçûk de bigihînim xwendevanan. Ev berhem dixwaze

me fêr bike çawa em bi dilpakî û dilovanî bi kesên li dora xwe bidin û bisdnin. Wek ku rovî ji mîrzayê biçûk re dibêje, rijtekî bêkêmasî tune.

Lê belê eger mirov hîn bibin bi dilpakî U tiştan binerin, kêmasî bêguman

beyî ku rabin wê gelekî kê m bibim.

Dr. Fawaz Husên

Swcd, Luled 1994.

IO

0

^ >< ^" ^

r

s'

"|/.J^

<

yc'

A

o\ < .

b

(0

j^:

V-c

j^ ^

II

JiLÊONWERTHre

Ez lêbuhurînê ji zarokan dixwazim ku min ev pirtûka hanê diyarî mirovekî mezin kir. Di destê min de behanek giran heye: Ev mirovê mezin di dhanê de dostê min yê herî hêja ye. Behaneke min î din heye: Ev mirovê mezin dikare di her rişd de û ta di pirtûkên ji bo zarokan de jî bigihêje. Behanek min ya sisyan heye: Ev mirovê mezin U Fransayê dijî û ew lê birçî ye û wî sar e. Ew bi hacet e ku mirov di ber dilê wî de bide. Eger ev hemû behanên hanê têrê nekin, ez dikarim vê pirtûkê diyarî zarokriya wî bikim. Hemû mirovên mezin, pêşî, zaro bûn (lê belê piraniya wan vê yekê ji bîr



dildn.) Ez wilo jî diyariya xwe rast dildm û dibêjim.

"JiLÊONWERTH regava

biçûkbû".

12

Gava ez şeş salî bûm, min carekê di pirtûkekê de ii ser Daristana xwezayî bi navê "çîrokên rastîn" nigareke (resmeke(

pir seyr dît. Di nigarê de marekî boa lawirek dadiqurtand. Va ye kopiyek ji wê nigarê.

Di pirtûkê de dihat gotin ku: "Marên boa nêçîrên xwe bi saxî dadiqurtînin. Paşê ew nema dikarin bilivin û di dirêjiya her şeş mehên serifandinê de radizên".

Ez wilo jî gelekî U ser serpêhatiyên cengelê ramiyam û bi qelemeke rengînî, min nigara xwe ya pêşîn çêkir. Nigara min ya hejmara yekê wilo bû:

13

Min şalîkarê xwe şanî mezinan da û ji wan pirsî ka nigara min ew ditirsandin. Wan \i min vegerandin: "Ma çima mirov wê ji kumekî bitirsin"?

Di nigara min de tu kum timebûn. Ew li ser marekî boa bû ku fîlek daqurtandibû û diserifand. Ez wilo jî bêgav bûm nava marê boa çêbikim ta ku mirovên mezin têbigihêjin. Bêyî ravekirinê, ew tucarî tişteki fêm nakin. Nigara min ya hejmara duduyan wilo bû:

Mirovên mezin pêşniyariyek li min kirin û xwestin ku ez dev ji marên vekirî an girtî berdim û bêtir guhê xwe bidim zemînnasiyê, dîrokê, hesab û rêzimanê. Wilo jî di şeşsaliya xwe de min dev ji pêşeyekê, ji hunerekî bi hêvî û ayindeyeke pir mezin berda. Ji ber biserneketina nigarên min ên hejmar i û

hejmar 2, dUê min sar bû. Mirovên mezin bi tenha xwe nikarin tu tiştî fêm bikin û bi rastî zehmet e ji bo zarokan ku ew hergav ji wan re tiştan rohnak bikin.

Ez serê we neyêşînim, ez bêgav bûm karekî din, pîşêyekî din ji xwe re bibînim û wilo jî ez bûm şufêrê balafiran. Bi balafîrê min dimya \i hev xist. Ê rast e ku zemînnasî di gera min de gelekî bi kêrî min hat. Min dikarîbû çavê xwe bigirta û vekira û min Çîn ji Arîzonayê nas dikir. Ev yek gelekî giring e nemaze eger mirov bi şevê xwe winda bike.

Wilo jî di dirêjahiya jiyana xwe de, min qiyamek pêwendî bi qiyametek mirovên giran re danîn. Ez gelekî li bal mezinan jiyam. Min ew ji nêzîkayî nas kirin lê belê nêrînên min di wan de nehatin guhertin û çêtir nebûn.

Gava di nav mezinan de ez rastî yekî dihatim û ku ew ji min re rewşenbîn xuya dibû, min nigara hejmara yekê ku min hilanîbû şanî wî dida. Min dixwest bizanîbûya ka ew bi rastî têdigihast an na. Wî mirovî hercar li min vedigerand: " Ev kum e." Wilo jî min behsa marên boa, daristanan û stêrikên asmanan nedikir. Min bi wî re li ser lîstikên bridgê, golfê, siyasetê û grafêtan behs dikir. Mirovê mezin wilo jî gelekî kêficweş dibû ku ew pêrgî ademekî wilo wek min bîaqil hatibû.

15

II

Ez wilo bi tenha serê xwe jiyam bê ku bi rastî kesek hebûya min bi wî re deng bikira ta carekê, berî anuha bi şeş salan, \i Sahrayê ii Afrîqayê balafîra min xera bû. Tiştêk di hundirê motorê wê de şikestibû. Ji ber ku ne hoste û ne rêwî bi min re hebûn, gerek min xwe bi xwe û bi tenha serê xwe çara wê dijawariya

mezin bidîta û balafîra xwe dirust bikira. Rewşa min bi rastî zehmet bû ji ber ku eger min balafîr çênekira, ji xwe ez ê U wê derê bimirama. Ava bi min re bi zorê têra heşt rojan dikir. Roja pêşîn ez H ser xîzê razam û di navbera min û avahiyan de bi hezarên mîian hebûn. Li wê derê rewşa min kambaxtir bû ji ya mirovekî şikestî H ser çend textan di nava deryayek bê hawe mezin de. Wilo jî hûn ê bizanibin ez çiqasî mat mam gava di destê sibehê de ez bi dengekî hûrik şiyar bûm: Ji kerema we... Ka ji min re berxekî çêk!

-Çi!

-Ka ji min re berxekî çêk...

Ez çenk bûm ser xwe wek ku marekî bi min vedabûya. Min çavên xwe fîrikandin. Min xweşik nêrî. Min çî dît! Mirovekî biçûk, gelekî seyr, \i ber min bû û \i min mêze dikir. Va ye nigara wî ya herî biserketî ku paşê min çêkir. Lê ez çî bêjim, nigar bifîre asmanan jî ew tucarî nagihêje toza bedewbûna mirovê ku min bi çavên serê xwe dît. Lê sûc ne sûcê min e. Di şeşsaliya min de û ji ber mezinan, dilê min ji nigarkîşiyê sar bûbû. Tiştê ku ez hîn bûbûm, tenê çêkirina marên gird û vekirî bû.

Min bi çavên nebawer û matmayî li mirovê li hember xwe nêrî. Ji bîr nekin ku ez bi hezarên mîlan ji avahiyan dûr bûm. Bi ser de jî, nîşanên windabûnê, westebûn, birçîbûn, rîbûn û tirsê pir ji binî ve li ser rûyê wî nexuyabûn. Wî yekcar nîşan

i6  
nedida ku ew lawikekî H sahrayê winda bû, lawikekî bi hezarên mîlan ji axa mirovan dûr bû. Gava zimanê min geriya, min jê re got:

-Kuro tu û van deran?

Owî wilo bi nermî, wek ku wî tiştêkî pir cedî bixwesta daxwaza xwe dubare kir:

-Ji kerema we... Ka ji min re berxekî çêk...

Gava mirov xwe H hember tiştêkî ku ji binî ve nakeve seriyar bibîne, ew nikare bêje na. Wilo jî H gel ku ez ji hemû avahiyan dûr bûm û H gel tirsar ku ez H wê derê bimirim, min kaxezek û qelemek ji berîka xwe dencistin. Lê belê wê gavê hat bîra min ku tiştê ku min xwendibû bêtir zemînnasî, dîrok, hesab û rêziman bûn û min ji mirovê biçûk re (bi hinek bêhtengî) got ku min nizanî nigar çêbikirana. Wî H min vegerand:

-Xem nake. Ka ji min re berxekî çêk.

Ji ber ku berê min tucarî benc û mîh çênekiribûn, min ji wî re yek ji wan herdu nigarên ku min dizanîbûn çêbikirana çêkir: nigara marê boa yê girtî. O ez gelekî mat mam gava mirovê biçûk H min vegerand û got:

-Na! Na! Ez fîiekî di zikê marekî boa de naxwazim. Marê boa gelekî xeterdar e û fîl jî gelek cîh digire. Li bal min pir biçûk e. Ez berxekî dixwaiim. Ji min re bencekî çêk.

Wilo jî min çêkir.

17

Wî bi baldarî mêze kir û paşê got:

-Na! Ev ê hanê nexweş e. Yeke din çêke.

Min nigar çêkir:

Hevalê min bi rûwkî xweş bişirî û goc

-Tu xweş dibînî ku ev ne berx e.

Ev beran e. Biner qiloçên wî hene...

Min wilo nigara xwe ji nû ve çêkir:

Lê ew wek nigara pêşîn nehat qebûl kirin.

-Ev ê hanê gelekî pîr e.

Ez berxekî dixwazim ku pir jiyar li ber wî hebe.

Gerek bû ku min bi lez motorê xwe vekira û ji ber timebûna wextê, min zû ev xêzên hanê çêkirin. Û min got:

-Va ye sindoq. Berxê ku tu dixwazî di hundirê wê de ye.

i8

Lê ez gelekî mat mam dema min dît ku rûyê rexnegirê min yê biçûk ji kêfa vebû:

-Min ew eynî wilo dixwest! Tu bawer dikî ku gelek giha ji vî berxî re divê?

-Çima?

-Ji ber ku li bal min pir biçûk e...

-Bê guman wê bes be. Min berxikekî pir biçûk da te.

Wî serê xwe bi ser nigarê de xwar kir.

-Lê ne wiqasî biçûk e wek tu bawer dikî...Wey! Wa ew di xew re çû...

Wdo jî min mîrzayê biçûk nas kir.

III

Ez zû bi zû tenegehaştim ew bi rastî ji ku derê dihat. Mînzayê biçûk pir pirs çêkirin û ji min re xuya bû ku wî guhê xwe yekcar nedida pirsên min. Di nav gotinên ku wilo çêhatin ser zimanê wî, tişt hin bi hin ji min re eşkere bûn. Wdo jî, gava ew cara pêşîn çav li balafîra min ket (Ez ê wêneya balafîra xwe tucarî çênekim ji ber ku ew ê ji bo min gelekî zehmet be) wî ji min pirsî:

-Ev tiştê hanê çi ye?

-Ev ne tişt e. Ev difîre. Ev balafîra min e.

Û bi serbilindî min jê re rave fikir ku ez difiriyam. Wî wê gavê bi dengê bilind got:

-Çawa? Na xwe tu ji asmanan ketiyê?

Min bi nefsbîçûkî vegerand:

-Erê.

-Wey! Kenê mirov bi vê yekê tê...

Û pîrçîniyek xweşik bi mîrzayê biçûk ket. Lê bi wê pîrçîniyê ez bêhteng bûm. Ez naxwazim ku kesek henekê xwe bi derdên min bike û wan biçûk bibîne. Paşê wî berdomand:

19

-Na xwe tu jî ji asmanan hatîyê! Tu ji kîjan gerestêrê yî?

Wê gavê hebûyîna wî ya wilo seyr ji nişkê ve li wê dera dûr ji min re hinekî rohnak bû û min bi lez jê pirsî:

-Na xwe tu ji gerestêreke din î?

Lê wî li min venegerand. Wî serê xwe bi nermî hejand û ii balafira min mêze lçir:

-Rast e ku bi vî tiştî tu nikarî ji dereke dûr bêyî...

Paşê wî demeke dûr û dirêj xwe di nav pêlên ramanan de winda kir. Û wî berxê min ji bêrlca xwe derxist û bi kûranî li wê gencînê pir li \xt dilê xwe giranbuha temaşa kir.

Hûn tédigihêjin çima ez gelekî mat bûm H ber van gotinên

IO

nîwekirî, nîweşartî, gotinên wek "gerestêrên din". Min hewl da xwe ta ku ez bêtir tiştan nas bikim û min pirsî:

-Tu ji ku derê harîyê, lcurrê delal? " Li bal te" yanî li ku derê?

Tu ê bencê min bi ku derê de bibî?

Wî piştî bédengiyek ramantije li min vegerand:

-Tiştê baş di vê sendoqa ku te dayî min de ew e ku bi şev

ew ê jê re bibe malilc

-Rast e. Ê eger tu qenc bî, ez ê werîsekî jî bidime te ta ku tu wî bi roj girêbidî. Ez ê singekî jî bidime te.

Ji min re eşkere bû ku pêşniyariya min ji binê ve ne bi dilê mîrê biçûk bû û ew ji ber jî aciz dibû. Wî pirsî:

-Ez wî girêdim? Çi fikreke tewş!

-Lê eger tu wî girênedî ew ê bi her deverê de here û winda bibe...

Ê car din pîrçînî bi hevalê min ket:

-Ma ew ê bi ku derê here?

-Bi her derê. Bi çi devera ku bê ber wî...

Wê gavê mîrê biçûk bi giranî rave kir:

-Ne xem e, li bal min pîr biçûk e!

Ê bi dilekî, belkî, hinekî şikesd, wî berdomand:

-Eger mirov wilo tenê rast biçê, ew nikare wiio dûr here...

IV

Min tiştêkî din jî pîr giring nas kir: gerestêra ku ew jê hatibû bi zorê ji xaniyekî mezintir bû!

Ez ji ber vê yekê geiekî mat nebûm ji ber ku min baş dizanîbû ku ji biî gerestêrên mezin ên ku nav ii wan hatibûn kirin wek Erdê, Muşterî, Merk, Zuhre, bi sedan gerestêrên din hene û di nav wan de wiio biçûk hene ku ew bi zorê bi dûrbînên asmanî tên xuyakirin. Gava stêrnasek yekê ji wan dibîne, ew di şûna navekî de hejmarekê didê. Wek nimûne, ew dikare jê re bêje "Stêra 3251."

u

X

\*

:^\*:|

my>m

.21

Geiek tiştan hiştin ku ez bawer bikim ku gerestêra ku mîrzayê biçûk jê dihat stêra B 612 bû. Ew stêrika hanê carekê tenê bi dûrbîna asmanî di 1909 de hatibû dîtin û yê ku ew peyda Idribû stêrnasekî tirk bû.

Wî wê gavê peydaya xwe di Civîna Navnetewî ya Stêmasiyê de bi şêweyekî xurt dabû xuya kirin, lê, ji ber cU û bei^ên wî, baweriya tu kesî bi wî neharibû. Mirovên mezin wilo ne.

Lê ji xêr û xweşbextiya stêra B 612 re, dîktatoiekî tirk ferma-  
^

nek ji bo miyetê xwe derxist û di wê fêrmanê de, yê ku cil û beigên europî li xwe nekira, ji xwe ê bihata kuştin. Wdo jî, bi cil û bergine pir lihevhad yê stêrnas di sala işzoan de dîsa peydaya xwe da xuyakirin. O wê gavê, baweriya her kesî bi wî hat.

w,

m

¥1

ir

Eger min ji we re ev kitekitên hanê li ser stêra B 612 gotin û hejmara wê ji we re eşkere kir, ev yek ji ber xuyê mezinan e. Mirovên mezin ji hejmar û nimreyan hez dikin. Gava hûn ji wan re li ser hevlekî biaxivin, ew tucarî pirsan li ser tiştên bingehîn nakin. Ew tucarî ji we re nat)êjin: "Gava ew diaxife, dengê wî çawa ye? Ew ji Icîjan lîstikan bêtir hez dike? Gelo ew perwanan, pinpinîlcan dide hev"?



Mirovên mezin çH şûna van pirsan de dit)êjin:"Ew çend salî ye? Çend birayên wî hene? Ew çend kîlo ye? Bavê wî di mehê de çiqas peran distîne"?

Ew tenê bi pirsên wilo bawer dikin ku dikarin xweş wî nas bilcin. Eger hûn ji mezinan re bêjin: "Min xaniyekî ji kerpîçên pembeyî dît, ew xanî bi gulên şemedanî bû û kevokên spî li ser banê wî hebûn...", mirovên mezin nikarin xaniyekî wilo di serê xwe de çêbikin. Gerek mirov ji wan re t)êje: "Min xani-

M  
yek dît hêja bû sed hezar frangên fransî." Wê gavê ew ê bi dengê bilind bêjin: "Xwedêyo çi xaniyekî xweşik"!

Wdo jî eger hûn bixwazin rastiya hebûna mîrzayê biçûk ji wan re bipeyitînin û tenê bibêjin ku ew pir xweşûc bû, ew dikeniya, wî berxek dixwest, mirovên mezin wê milên xwe bihejînin û ew ê we zarok bibînin. Lê eger hûn ji wan re bibêjin: "Gerestêra ku ew jê dihat stêra B 612 bû", ew ê wê gavê ji we bawer bikin û bi pirsên xwe serê we biêşînin. Mezin wilo ne. Geiek zarok diê xwe ji wan negirin. Zarok gerek bi mezinan re diiovan û bêhnfireh bin.

Lê heibet em bi xwe, em jiyanê fêm dikin, em tu rûmetê nachn hejmar û nimreyan. Min ê bixwesta ev serpehatiya hanê bi şeweya çîrokek ji çîrokên periyên dest pê bikira. Min ê bixwesta wiio bigota:

"Hebû nebû rehme ii dê û bavê min û we bû. Mîizakî biçûk hebû. Ew ii ser stêrekê dijiya û ew stêr bi zorê ji wî mezintir bû. Ew mîrza, ji xwe re ii hevaiekî digeriya..." Ji bo kesên ku jiyanê fêm dikin, bêhna rastiya ê lîêrir ji van gorinên hanê bê.

Ez vê yekê dibêjim ji ber ku ez naxwazim ku yek bi çavekî biçûk ii pirtûka min binere. Ez bi behskirina van bîranînan gelekî xemgîn dibim. Ev heye şeş sal ku hevalê min bi berxê min re çûye. Eger ez anuha dixwazim saiixdana wî bidim, ez vê yekê dikim ji ber ku ez naxwazim wî ji bîr bikim. Ji bîr kirina hevalekî tişteki xemtijî û zehmet e. Her kes nikare rojekê bêje "hevaiekî min hebû". Ez jî rojekê dikarim bibim wek mirovên mezin ên ku tenê guh ii hejmaran dikin. Ji ber vê yekê jî, min qutiyek rengên corljecor û qelem kirîn. Gava ez şeş salî bûm ez tenê hînê çêkirina nigarên marên boa ên girtî bûbûm û anuha Xwedê tenê dizane çiqasî bi min zehmet e ku ez dîsa li nigarkîşiyê, li resmê, vedigerim! Helbet heta ji min bê, ez ê sûretê wî xweşik çêbucim û ez ê bixwazim ku ew nêzîkî rastiye

5«

be. Lê ez bi giştî ji xwe ne bawer im ku ez ê bi ser kevim. Gava ez dinerim, ez çî dibînim? Ez dinerim ku nigarek baş tê û ya li dû ne wek wê ye. Ez ii ser pîvanan jî hinekî xwe şaş dikim. Di nigarekê de mîrzayê biçûk gelekî mezin e, di ya din de, ew geleid biçûk e. Ez ii ser rengê çûnê wî dudû dibim. WUo jî, wek koran, çî baş çî xerab, riştê ku ji destê min tê, ez dUdm. Bêguman ez ê li ser kitekirine pir giring jî xwe şaş bikim. Lê ez çî bikim, gerek hûn li min bubuhirin. Hevaiê min tucarî tişt ji min re rave nedidr. Wî t>eiid bawer dildir ku ez wek wî bûm. Lê beiê, mixabin, min nikarîbû wek wî di sindoqên girtî de t)erx bidîtana. Belld ez hinekî wek mezinan bim. Bêguman ez pîr bûme.

Her roj ez tişteld nû li ser stêra wî, çûyîna wî, rêwîtiya wî hîn çHbûm. Ew tiştên hanê ji ber xwe ve di nav gorin û nêrînan

de hêdîca derdiketin. Wiio jî di roja sisiyan de min çîroka  
bela darên baobabê û serêşên mîrzayê biçûk nas kir.  
Wê carê jî ew yek bi saya l)erx bû. Mîrzayê biçûk ji nişkê ve  
û bê destpêk, bi giranî, wek ku behsa tişteid pir birûmet biidra,  
ji min pirsî:

-Rast e ne wiio ku berx şitiiên daran dixwin?

-Belê. Rast e.

-Kêfa min ji vê yekê re tê.

Ez têngihaşrim çima pir girîng bû ku berxan dUcarîbûn şirilên  
daran bixwarana. Lê mîrzayê biçûk berdomand:

-Na xwe ew darên baobabê jî dixwin?

Min wê gavê mîrzayê biçûk li ber xist ku darên baobat)ê ne  
darine biçûk bûn. Ew wek kelîsan mezin û bUind bûn û eger  
wî keriyeid fil jî bi xwe re bibira, wî keriyê hanê ê nUcarîbûya

26

tenê darek ji darên baobabê tev bikira.

Sûietê keriyekî fîlan kenê mîrzayê biçûk anî:

-Wê gavê gerek e ku fîl hemû ii ser hev siwar bin,.

Paşê wî bi zanebûn got:

-Darên baobabê, berî ku mezin bibin di destpêka xwe de  
biçûk in.

-Rast e! Lê çima tu dixwazî ku benc şidên darên baobabê  
bixwin?

Wî li min vegeiand wek ku wî dixwest bigota "Camêr ma  
pirs ji vê yekê re divê?" Gerek ez bi rastî geiekî jîr bûma ta ku  
min bi tenha serê xwe ew tişt fêm bUdra.

27

Li ser gerestêra mîrzayê biçûk, wek li ser hemû gerestêrên

din, gUiayên ba^ û gihayên xirab hebûn. WUo jî tovên ba^ gihayên baş didan û tovên xirab gihayên pîs didan. Lê tov bi çavan nayên dîrin. Ew di zikê erdê de veşard ne û xewa xwe dikin, ta ku rojekê tê bîra yekê ji wan şiyar bibe...WUo jî ew xwe vedizilîne, pêşî ajekî qeisî bêzar ber bi rojê hêdika bUind dUce. Eger ajê biçûkî qeis yê rivrê an guiê be, mirov dikare wî bUiêle ta ku ew li gora dUê xwe dirêj û xurt bibe. Lê eger mirov nas bike ku aj yê darek pîs be, gerek e ku ew hema di wê deqê de wê ji qurmê wê de rake. WUo jî li ser gerestêra mîrzayê biçûk tovîne pir xirab hebûn...Ew tovên darên baobabê bûn. Zemîna gerestêra mîrzayê biçûk ji wî tovê wek moxUê bû. WUo jî, eger mirov di destpêkê de zû çareyekê ji ajek baobabê re peyda neke, ji xwe ew nema tucarî jê xelas dibe. Eger

28

Xwedê neke ku hat û aj mezin bû, ew gerestêrê dadigire û wê bi rehên xwe qul dike. Û eger gerestêr biçûk be, û eger darên baobabê pir bin, ji xwe ew dar gerestêrê beiaweia dUdn. Paşê mîrzayê biçûk ji min re digot: "Pirs pîrsa nîzamê ye. Pişd ku mirov sibehê xwe dişo û vedişo, gerek e ku ew paşê xweşUc gerestêra xwe baqij û temîz bUce. Gerek e ku ew zorê li xwe bike ta ku bi hawald berdewamî darên baobabê ji qurm lake. Ew di destpêka xwe de pir bi ser darên gulan diçin û hema mirov wan ji hev derxîne gerek wan rake. Ev karê hanê geiekî nexweş e, lê beiê karekî pir hêsan e". Û rojekê wî pêşniyariyek ii min kir û xwest ku min seiê xwe bi wêneyeke xweşik bêşanda ta ku min xetera darên baobabê xweş têxista serê zarokên gerestêra xwe. Wî ji min re digot: "Eger rojekê ew bi deverêkê herin, ev yek wê bi kêrî wan bê.

Carinan xem nake eger yek karê xwe yê îro bû îro rojeke din.  
Lê eger pirs bû pirsarî darên baobabê, derengxîsrîna kar wê herdem  
bobeiatên mezin bi xwe re bîne. Min gerestêrek nas kir,  
mîrovekî tembeî li ser bû. Wî guh li sê şîtiyan nekiribû" ...  
Li gor daxwaziyên mîrzayê biçûk, min wêneya wê gerestêra  
hanê çêkir. Ez yekcar naxwazim tembîhanî xelkê bûdm. Lê jî  
ber ku bi rastî kesek xweş xetera darên baobabê nas nake û  
eger yek rojekê xwe jî ser gerestêrekê bibîne û wan jî bîr bike  
wê zehmetiyên pîr mezin jî ber serê wan daran peyda bibin,  
min tenê wê carê xwest tembîhanî bikim. Ez dibêjim: "Zarokno!  
Bîha hayê we jî darên baobabê hebe!" Min pîr serê xwe bi  
vê wêneya hanê êşand ta ku ez hevalên xwe agahdar bildm ku  
jî mêj ve xeterek nêzîkî wan û nêzîkî min bi xwe jî hebû. Dersa  
ku min dida hêja bû ku min zor li xwe bikira. Hûn ê belkî  
jî xwe bipîrsin: çima di vê pirtûkê de nîgarîna din wUo xweşUc  
û dUbir wek nîgara darên baobabê nine ne"?

29

i:t

j^

j^

3>

j^

^

^^[

r

"^v

i?

^

2îî'

^3

^

^

■Ö

^

30

Bersiv hêsan e: min xwest îê ez çî bikim bi destê min derneket.  
Gava min nigara darên baobabê çêkir, ez dizanim ku taya  
iezê ez zeft kiribûm.

t

VI

Ax! mîrzayê biçûk, ez hin bi hin bi ser jiyana te ya bi kiU û  
derd vebûm. Di demeke dirêj de kêfîcweşîya di jiyana te de tenê  
ew bû ku te ji xwe re ii rokê dinêrî çawa diçû ava. Min ev  
kitekita hanê biyaniya roja çaran nas kir, gava te ji min re got:

-Ez ji roavaçûyînan hez dikim. Heydê em ji xwe re li rokê  
binerin bê çawa diçe ava...

-Lê gerek e em ii bendî wê xwe ragirin...

-Li l)enclî çî?

-Li bendî rokê ta ku here ava.

Eşkere bû ku pêşî tu geiekî mat bûyî û paşê kenê te bi te  
hat. O te ji min re got:

-Ez herdem bawer dikim ku ez hêna li bal xwe me!

31

Rast e. Gava li Amerîkayê nîvro ye, her kes dizane ku rok, li  
Fransayê, dere ava. Eger wUo jî mirov bikaribe di deqakê de  
xwe ji Amerîkayê bigihîne Fransayê, ew ê bikaribe li rokê tema^

a bUce çawa çHçe ava. Mixabin, Fransa têra xwe dûr e. Lê ii ser stêrika te ya wUo pir biçûk, besî te bû ku tenê te sendeliya xwe çend gavan bikişanda. O te ji xwe re, her gava ku dilê te dixwest, ii rokê çHnerî diçû ava...

-Rojekê, Min çU û sê caran çHt ku çawa rok diçû ava!

Û hineid paşê, te berdomand:

-Tu çHzanî...Dema mirov geleid xemgîn be, ew hez dUce li avaçûna rokê binere...

-Na xwe wê roja çU û sê caran tu wiqasî xemgîn bûyî?

Lê mîrzayê biçûk vengerand.

VII

Roja pêncan, herdem bi saya berx, sir û raza jiyana mirzayê biçûk ji min re diyar bû. Wî ji nişkê ve, bê destpêk, ji min pirsî, weke ku ew ji mêj ve li ser tişteid ku di serê wî de baş stewiya bû hûr dibû:

-Eger benc ajan dixwe na xwe dilcare gidan jî bixwe?

-Berox çi dUceve ber dixwe.

-Heta gulên bi srirî jî?

-Belê. Ew gidên bi stirî jî çHxwe.

-Na xwe fêda stiriyan ma çi?

Min nizanîbû. Ez wê gavê bi mîxpêçê motorê xwe daketibûm wUo şidayî bû ku min dUdr nedikir sist nedibû. Derdên min giran bûn ji ber ku aloziya motorê min hin bi hin ji min re dijiwartir xuya çHbû û ava vexwarinê tev dibû û ez ji tiştin dijiwartir dirirsiyam.

-Naxwe fêda sririyan maye?

32

Mîrzayê biçûk gava pirsek fikir tucarî ji dû wê mirî venedigeriya.

Ez ji ber mîxpêçê l)êhteng bûm û hema çî hat ser zimanê min min vegerand:

-Stirî, fêda wan tune. Ew tenê nedurisd û pîsîtiya giUan dicHn xuya kirin!

-Çî!

Pêşî ew hineid t)êdeng bû û paşê wî bi qehr û ldn ji min re got:

-Ez ji te bawer nakim! Gui qeîs in. Ew kawik û sade ne, li gor tewanên jcwe dUê xwe bi xwe xurt dUdn. Di baweriya wan de ku ew bi wan stiriye xwe dikarin her kesî ji xwe bitirsînin... Min dengê xwe nekîr. Min di wê kêîka hanê de ji xwe re got: " Eger mîxpêç wiio asê bimîne, ez ê wî bi çakûçeld tenê hûrhûrî bikim." Mîrzayê biçûk dîsa ramanên min birrî.

-Û tu bi xwe, tu bawer diid ku gul...

-Na! Na! Ez tutîştî bawer nakim! Çî hat ber devê min min got. Ez, ez serê xwe bi tiştên cedî dêşînim!

Wî matmayî li min nêrî:

-Te got tiştên cedî?

Wî ii min dinêrî çawa çakûçê min di destê min de bû, çawa riiyên min di nav zeyta reş de bûn, çawa min xwe bi ser wî tiştê ku ji wî re geield nexweşik bû xwar idribû.

-Tu wek mezinan deng diid?

Min hinekî ji ber xwe şerm ldr. Lê wî bi cHlekî hişk wek kevir t)erdomand:

-Tu her tiştî teviihev dild...Tu her tiştî tevlihev dild!

Ew bi rastî geield bêhteng bûbû. Wî porê xwe yê zêrînî li t)er bê dihejand:

-Ez ii ser gerestêrekê miroveld sorî qirmizî nas dikim. Wî



cH temenê xwe de tucarî giUek bêhn neldriye. Wî tucarî U stêrikekê neneriye. Wî tucarî ji kesekî hez nekiriye. Wî ji bUî

33

berhevkirina hejmaran di temenê xwe de tişteki din nekiriye.

Orojê gişî ew hema wek te dubare dike û cHbêje:

"Ez mirovekî cedî me! Ez mirovekî cedî me!" Ew bi vê yekê serê xwe pir bilind cHke. Lê beiê ew ne însan e, ew kvark e!"

-Ew çi ye?

-Ew kvark e!

Rûyê mîrzayê biçûk anuha ji ber bêhtengiyê bûbû hîzar.

-Ji miiyonên salan gul stiriyan çêdUdn.

Ji milyonên salan berx li gel hebûna stiriyan gulan dixwin.

Ma ne tişteid cedî ye ku mirov bixwaze bizanibe çima gul wiqasî

xwe dêşînin ta wan stiriyan bêkêr çêdikin? Ma şerê giU û

berxan şereld bêrûmet e? Ma ew ji berhevkerinên Axayekî sorî

qeiew ne cecHtir e? Ê eger li ser gerestêra min guieke het)je ku

weke wê ii dunyayê gişî turet)e, û eger t)erxeyid biçûk bê ku bizanibe

çi dike diicare rojekê wê bi hêsanî winda bike, ma ev

tiştê hanê ne giring e?

Ew sor bû û paşê, wî berdomand:

-Gava guleke mirov hebe ku li ser milyon milyonên stêrikan

ji bUî wê tu gulên din nebin, ew yek bes e ku ew mirov

bextewer bibe dema iê binere. Wî ji xwe re got: " Gula min di

dunyayê de li derekê ye..." Lê eger berx gulê bixwe, dimya ê li

ber çavên wî mirovî tarî bibe, wek ku hemû stêrik ji nişkê ve

bi hev re vemirin! Ma ev tiştê hanê ne mezin e?

Wî nema karîbû bêtir dengê xwe bikira û ji nişkê ve bû kûrekûra

wî. Şev keribû. Min dev ji hesinên xwe berdabû. Nema

xema min bû ne çakûçê min, ne mîxpêça min ne tîbûn û  
ne mirin. Li ser stêrikekê, ii ser gerestêrekê, ya min, ii ser Erdê,  
mîizadeyekî biçûk hebû û gerek bû ku min di ber dilê wî  
de bida! Min ew xist hembêza xwe. Min ew lorand. Min jê re  
digot: "Gula ku tu jê hez dikî ne cU xeterê de ye...Ez ê ji wî re,  
ji t)encê te re, devbendekê çêbikim...

34

n

Ez ê ji gula te re kirasekî hesinî çêbikim...Ez ê..." Min nema  
xweş dizanîbû min ê çî bigota çî negota, ne çî bUdra. Min nizanîbû  
çawa ew haş bikira, ii ku derê xwe bigUianda wî. Bêxwedîka  
welatê hêsiran çiqasî weiatekî nediyar û bi dûman e.

VIII

Min zû ev gula hanê baş nas kir. Li ser stêra mîrzayê biçûk  
herdem gidên sade, gulên bi rêzek peiUc hebûn. Wan gulan ne  
ciyekî mezin cUgirtin û ne kesek ji xwe nerehet cUkirin. Ew di  
danê sibehê de cU nav giha de hêşîn dUiatin û danê êvarê dimirin.  
Lê belê, eva hanê, rojekê ji tovekî ku kesekî nizanîbû ji  
ku derê haribû zU dabû û mîrzayê biçûk baş ji nêzîkayî bala  
xwe dabû wî gihayê ku bi ser tu gUiayên din de necUçû. Dibû

35

ku ew tîjê hanê celebekî din ji darên baobabê bû. Lê ew aja  
hanê zû rawestiya, nema mezin bû û dest bi dana giUekê kir.  
Mîrzayê biçûk bi çavên serê xwe bi dUsojî cHnêrî çawa wê ajê  
bişkoteke pir mezin da û dizanîbû ku wê rişteki dûrî aqian jê  
derketa. Lê beiê gulê hema xwe kok dUdr, di oda xwe ya kesk  
de hema dixemUand û rengên xwe heidibijart. Wê bi bêhna  
fîreh xwe kok dUdr, peiUcên xwe yekoyeko rast û şayUc dikir.

Wê nedixwest wek gulebûkan qermîçokî bibişkuviya. Wê dixwest kengî payan ji xweşUcbûna wê re nemap wê gavê derketa. Erê çima na! ew guleke pir jixwehiz û dUnaz bû! Wê wiio jî xwe iai roj û şevan kok û xemUand. O rojekê, di destê sibehê de, bi derketina rokê re, wê xwe da xuyakirin. Lê erê wê bi roj û saetan xwe kok û tekûz kiribû û xwe ji wê kêlîka derketinê re amade kiribû, wê devbawîşkî got:

-Ez nû ji xew radibim.

36

Li min bibuhure... Hîna porê min ne şehkirî ye. Mîrzayê biçûk nizanîbû çawa hejmetkariya xwe li ber xweşikbûna wê bigirta û got:

-Tu çî xweşik î!

Gulê bi nermî vegerand:

-Ma ne wiio ye. Tu

jî dibînî ku ez û rokê em bi hev re çêbûne...

Mîrzayê biçûk têdencist ku ew ne wîqasî nefsbîçûk bû, lê ew çî naz û diirevîn bû!

Wê paşê berdomand:

-Ez bawer dikim ku wexta taşriya min e. Xwedê bUce ku te haziriya min kiribe.

Omîrzayê biçûk, şaşomaşo, rabû çû avreşan tije ava hênUc kir û li ber destê giUê çû û hat.

Wê gulê ji destpêkê de bi pozbuindî û bedgumanên xwe ew êşandibû. Rojekê, wek nimûne, wê behsa her çar stiryên xwe dikir û ji mîrzayê biçûk re gotibû:

-De bUa pUing bi navperûşkên xwe bên ku ez wan bibî-

37

mm

Wê gavê mîrzadeyê biçûk lê vegerandibû:

-PUing ii ser gerestêra min timene, û paşê, pUing gUia naxwin.

GiUê bi dengekî nizim vegerand:

-Kê ji te re gotiye ku ez giha me?

-Li min bibuhure...

-Ez ji pUingan natirsim, iê ruhê min ji surrên bê diçe. Ma surreperdak li bal te tune ku tu ji min re bînî?

Mîrzayê biçûk di dUê xwe de got: "Çî l)extekî reş eger gihayek ji surrên bê hez nelce! Ev gula hanê geiekî tevlihev e"...

-Êvarê, tu ê min cU bin cameke girover de binixumînî. Li bal te sar e. Ciyê te ne pir xweş e. Ji ciyê ku ez têm...

Lê wê gotina xwe zû birrîbû. Ew wek tovekê hatibû û wê tu dunyayên din bi rastî nas neldrbûn. Ji ber derewek wUo pir eşicere, ew li t)er xwe ketibû û wê du-sê caran xwe kuxandibû û gotibû:

-Tu çi dikî vê surreperdê ji bo min nayênî?

38

-Min ê ew biyaniya ta te bi min re diaxivî!

Ta ku dîsa jî wê bihişta ku mîrzayê biçûk bêtir li ber xwe biketa, wê kuxika xwe xurtir kir.

WUo jî mîrzayê biçûk, ii gel diixwazî û hezkirina xwe, zû jê ket şUcê. Wî guhê xwe dabû gorinên wê ên vala û wUo jî geiekî xemgîn bûbû.

Wî rojekê derdê dilê xwe ji min re diyar kir. "Gerek min li gorinên wê giUidarî nekira. Gerek mirov tucarî gidiê xwe nede gotinên gulan. Gerek ew tenê ji xwe re ii wan binere û wan

39

bêhn bike. Gula min bêhna xwe ii hemû gerestêrê belav dikir  
û min nizanîbû giranbuhaya wê kêfîcweşiyê nas bikira. Çîroka  
navperûjkan geiekî bêhna min teng kiribû iê pašê diîê min tenikkiribû"...

-Min tiştekek fêmkir! Gerek min ew ne ii gor gotinên wê lê  
H gor karûbarên wê ew bidîta Wê min di nav bêhna xweş de  
dûişt û dilê min rohnî dikir. Gerek ez tucarî wilo nereviyama!  
Gerek min li paş fenên wê ên biçûk û bêzar tenikbûna dUê wê  
bidîta. Gul îro tiştekekî dibêjin û sibe tiştekekî din dibêjin! Lê belê  
ez gelekî ciwan bûm û min nizanîbû xweş jê hez kiriba"

IX

Ez bawer dikim ku wî bi saya fîra refek firendeyên bejî ji  
stêrUca xwe bazda. Di sibeha roja çûyîna xwe de, wî gerestêia  
xwe baj rast kir. Wî argûn û bixêrîka agirfîşanên (volkanên(

40

xwe ên pêketî paqij kirin. Du agirfîşanên wî ên pêked hebûn.  
Ew ji bo germidrina taştê geiekî bi kêrî wî dihatin. Agirfîşaneid  
wî vemirî jî hebû. Lê, wek ku wî digot: "Kî dizane!", wî ew  
jî paqij kir. Eger agirfîşan xweş bên paqijldrin, agirê wan bi  
lengeld berdewam û wekhev herdem dişewite û tucarî wilo jî  
ew nacoşin. Coşanên buricanan wek agirên bixêrîkan in. Lê li  
ser erda me, eşkere ye ku em pir biçûk in ta ku em bikaribin  
argûnên burkanan paqij bildn û ji ber vê yekê jî, gava ew pêdikevin,  
ew gelek seiêşan ji me re peyda dildn.

, /

Mîrzayê biçûk, bi dileld hineld şikestî, ajên dawîn ên darên  
baobabê rakirin. Wî di serê xwe de ji xwe re digot ku gerek  
ew tucarî venegeriya. Lê di danê wê sibehê de, hemû karûbarên  
rojane geiekî ii ber dilê wî şîrîn xuyabûn. O gava wî ji bo

cara dawîn giU avda û xwest ew binuxumanda, ew kelegirî bû.

Wîji gulê regot:

-Xwedê negehdarê te be.

Lê wê dengê xwe nekir. Wî dubare kir:

-Xwedê negehdarê te be.

Gul kuxiya. Ew kuxuya lê belê ne ji ber ku wê serma xwaribû.

Wê dawî dengê xwe kir û jê re got:

-Ez ehmeq û nezan derketim. Ez dixwazim ku tu li min bibuhurî.

Di nav xêr û xweşiyê de bimîne!

Mîrzadeyê biçûk mat ma ji t)er ku wê rexnên xwe wek hergav

nekirin. Cam di dest de, ew bi heyrek mezin li wê derê

ma û wî nizanîbû çî biidra çî nekira. Ew di wê nermiya wê ya

bêdeng û bêrexe de nedigihast. Gulê got:

-Erê ez ji te hez diidm. Sûc sûtê min bû ku te ev yek nas

neldr. Lê anuha ev ji binî ve bêqîmet e. Lê tu jî wek min ehmeq

derketî. Bimîne di nav xêr û xweşiyê de... Dev ji vê camê

berde. Ez nema wê dixwazim.

-Lêba..

-Ez ne wîqasî nexweş im... Bayê hênik yê şevê wê ji bo min

baş t)e. Ji bîr neke ku ez gulek im.

^1 -teba...

-Ez bêgav im du-sê kurmên daran hiigirim eger ez bixwazim

rojê pinpinîkan nas bildm. Dibêjin ku ew pir xweşUc

in. Eger ew neyên seriêdana min ma kî wê bê? Tu ê dûr bî.

Eger pirs bê ser tebayên mezin, ez ji tiştêkî natirsim. Ma ne

navperûşkên min hergav hene.

42

Û wê bi dilekî sade û kawikî her çar stiryên xwe nîşan dan.

Paşê wê berdomand:

-Ma tu wUo wek seneman bi derewan li bendî çî yî? Here!  
Eger te biryara xwe û çûyînê daye, here, oxira ta ya xêrê be.  
Wê ev yek got ji ber ku wê nedixwest ku mîrzayê biçûk çav  
li hêsirên wê biketa. Ew giU guleke pir pozbUind bû...

Di wê navçeyê de, mîrzayê biçûk ne dûrî stêrikên 325, 326,  
329 ,328 ,327û 330Î bû. Wî dest bi serlêdana wan kir ta ku bayek  
ji ber serê xwe berda û ji xwe re hînî tiştan bibûya.

Qiralek li ser stêrika pêşîn hebû. Xeftanekî sorî qaçimî lê,  
ew li ser textê xwe yê padîşahiyê rûniştî bû. Textê wî erê wUo  
sade bû lê di eynî wextê de gelekî kubar bû.

Qiral hema çav li mîrzayê biçûk ket bi dengêkî bUind got:

-Va ye rajêrek, peyak.

Mîrzayê biçûk wê gavê ji xwe pirsî:

-Ma çawa ew dikare min nas bike eger tucarî berê çav li  
min neketiye"?

Wî nizanîbû ku ji bo padîşah û qiralan, cîhan giş gelekî sade  
cUbû. WUo jî, hemû mirov ji bo wan rajêr, peye bûn.

-Were nêzîkî min ta ku xweşik çavên min te bibînin. Qiral  
wUo bi kêf û serbilindiyek mezin jê re got ji ber ku, dawiya  
dawîn, ew li ser serê keseld dibû qiral.

Mîrzayê biçûk bi çavên xwe li ciyekî rûnişrinê geriya lê ji  
ber xefîanê qaçimî pir )cweşik cîh li ser gerestêrê nemabû. Wilo  
jî ew bêgav bû li ser darên nigan ma û ji ber ku ew westiyayî  
bû, bawişld bû.

43

Qirai jê re got:

-Na, ne ii gor rêzikên dîwanê ye ku yek li hemt)er qiral bawişld

bibe. Ez wê li te qedexe dikim.

Mîrzayê biçûk bi şermezariyek mezin got:

-Bawîşdbûyîn ne bi destê min e. Rêya min dirêj bû û xew bi çavên min nebûye...

Qiral jê re got:

-Vê gavê ez fêrmanê cHdime te ku tu bawîşkî bibî. Ji mêj ve min nedîtiye kesek bawîşkî cUbe. Bawîşkîbûyîn ji bo min tişteki baUcêş e. De ka bawîşkî bibe, ev fêrman e.

-Ez ketime bin şermê... Ez nema dikarim... Mîrzayê biçûk wUo got û rûyê wî geieid sor bû.

Qiral vegerand:

-Na xwe wUo! Na xwe wiio! Vê gavê ez... ez fermanê cHdim ku carinan tu bawîşid bîbî û carinan...

Wî gotinên xwe xumxumand û eşkere bû ku ew bêhteng bûbû.

Ew bêhteng bûbû ji ber ku wî dixwest ku her kesî rûmeteke mezin bidaya desthiyat û fermanên wî. Wî ji binî ve qebûl nedUdr ku yekî serê xwe li ber fermanên wî rakira. Ew padîşaheke giştî bû lê ji ber ku ew geleid rind bû, wî fermanine aqUane didan. Wî piraniya caran digot:

"Eger ez fêrmanekê derxînim û ji serdarekî bixwazim ku ew xwe bUce fîrendeke deryayî û eger ew serdar fermana min bi cîh neke, çewitî wê ne ya serdar be. Ew ê ya min be.

Mîrzayê biçûk bi şermezari pirsî:

-Ez dilcarim danişim?

Qiral lê vegerand:

-Ez fermanê dicUm ku tu danişî.

Û wî bi giranî û meznayî perçak xeftanê xwe yê qaqimî t)er



bi xwe ve anî.

Lê mîrzayê biçûk devjihev mabû. Ew gerestêra hanê geield

44

biçûk bû. Wî qiralî wê bi rastî ii ser çi hukum bikira? Wî got:

-Şahê min... ez bexşînê ji we dixwazim ji ber ku pirsine min hene.

Qiral wê gavê bi lez got:

.fr^4^

-Ez fermanê didim ku tu pirsan ji min bUd.

-Şahê min... Ma hûn li ser çi hukum dUdn?

Qiral bi zimanekî pir sade bi lêv kir û bi destê xwe der û dora xwe nîşan da:

-Li ser hertişd!

Mîrzayê biçûk got:

45

-Li ser hertiştî?

Û qiral lê vegerand:

-Belê H ser herrişti...

Wdo jî ew ne tenê qiralekî giştî, lê qiralekî cîhanî, geyd bû.

O -stêr bi fermana we dikin?

Qiral got:

-Helbet. Ew di cîh de bi ya min cUkin. Ez ji binî ve t)ênîzamiyê qebûl nakim.

Karîn û tewanek wUo mezin mîrzayê biçûk mat hiştin. Eger desthUatîyek wUo di destê wî de hebûya, hê ku wî sendeliya xwe ji ciyê wê bUdşanda, wî ê ne çil û çar caran, lê heftê û du caran, belkî sed an du sed carî di rojê de li avaçûna rokê temaşa bildra! Ji ber ku wî xwe hinekî xemgîn didît gava gerestêra

wî ya bêxwedîmayî hate bîra wî, wî ceger kir ji qirêl bixwesta ku wî hêviyek wî bi cîh bikira:

-Ez dixwazim bibînim rok diçe ava...Kêfa diîê min bînin...

Fermanê bidin ta ku rok biçe ava...

-Eger ez li serdareld fermanê bUcim ku ew mîna pinpinîkê ji gidekê bifîre guleke din, an ku ew trajediyekê binivîse, an jî ku ew xwe bike fîrendeyeid deiyayî û eger ew serdar fermanê bi cîh neke, ji me herduyan, çewd ê ya kê be?

Mîrzayê biçûk bi baweriyek mezin got:

-Ew ê ya we be.

Qirai berdomand:

-Te rast got. Gerek em ji her yekî li gor tewanên wî tiştan bixwazin. Desthilati berî her tiştî li ser aqU ava ye. Eger tu fermanê bidî mUetekî û jê bixwazî ku ew xwe bavêje ava deiyayê, ew mUet ê di rûyê te de rabe û daxwaza te bişldne. Mafê min heye ku ez bixwazim ku fermanên min bi cîh bibin ji ber ku fermanên min ne dûrî aqilan in.

Gava mîrzayê biçûk pirsek dUdr, ew nema ji dû wê vedigeriya û wUo jî wî pirsaxwe dubare kin

46

-Û daxwaza min û roavaçûyîna?

-Xwe ragire roavaçûyîna te wê bigUiêje te! Ez ê fermana wê bidim. Lê li gor şeweya hukumdariya min, ez ê xwe ragirim u ku mercên wê yekê peyda bibin. Bêhna fîreh. Her rişt di wextê xwe de baş e.

Mîizayê biçûk pirsî:

-Ew ê kengî be?

Qiral pêşî li salnameyeke mezin nêrî û paşê got- :

Kengî! Kengî! Ew ê nêzîkî... nêzöd... ew ê vê êvarê nêzUd saet hef û çUî be! Ê tu ê bi çavên serê xwe bibînî çawa fermanên min ê bi cîh bibin.

Mîzayê biçûk bawişkî bû. Wî gelekî dixwest ew roavaçûyîna hanê bidîta. Paşê jî wî dest pê kiribû hinekî aciz dibû. Wî ji qiral re got:

-Tu Icarê min û vê derê nema. Ez ê herim!

Qiral serbUind bû ku rajêreld wî, peyekî wî çêbûbû û got:

-Neçe, Neçe, ez ê te bikim wezîr!

-Wezîrêçi?

-Wezîrê...erê yê dadmendiye!

-Lê kî li vê derê heye ta ku ez li ser serê wî bibim dadmend?

Qiral jê re got:

-Kî clizane! Ez hêna li der û dora memleketa xwe negeriyame. Ez gelekî pîr im, ciyê paytonekê ii bai min tune û ez cUwestim gava dimeşim.

Mîzayê biçûk xwe xwar kir û wUo jî wî li aliyê din yê gerestêrê nêrî:

-Lê min dîtiye. TiUces ii wê derê jî time...

Qiral lê vegerand:

-Baş e, wê gavê tu ê bibî dadmendê xwe. Ji xwe ya herî zehmet ev e. Ew geiekî zehmetir e ku mirov biryamamena di derheqa xwe de bide ku di derheqa kesên din de. Eger tu bi-

47  
karibî baş xwe hukum bikî, ji xwe wê gavê tu ê mirovekî bi rastî gelekî zana bî.

Mîzayê biçûk got:

-Ez li ku derê bim ez dUcarim xwe hukum bikim. Ez ne bêgav

im ji bo vê yekê ii vê derê bijîm.

Qiral got:

-Baş e! Baş e! Ez bawer dikim ku li ser gerestêra min ii derekê mişkekî pîr heye. Bi şev ez dengê wî dikim. Tu dUcarî biryarnameyan di derheqa vî mişkê pîr de bidî. Tu ê carcaran hukmê mirinê lê bibirî. WUo jî, jiyana wî ê bi dadmendiya te ve girêdayî be. Lê her carê tu ê bexşînê jê re bînî ta ku ew sax bimîne. Ji bilî wî tu mişkên cUn tunene.

Mîrzayê biçûk vegerand:

-Ez, ez naxwazim fermana kuştinê bidim. Ez bawer dikim ku ez ê biçim.

Qiral got:

-Na, neçe.

Lê belê mîrzayê biçûk, pişti ku karûbarên xwe ên çûyînê kir, nexwest cHê padîşahê pîr bUiišta:

-Eger padîşahiya we bixwaze ku fermanên wê gotin bi gotin bi cîh bibin, ew dikare cH derheqa min de fermaneke aqUane dendne. Ew dikare, wek nimûne, fermanê bide ku ez piştî deqakê ji vê derê bar bikim. Ez bawer dikim ku mercên fermanelce wUo peyda bûne...

Padîşah dengê xwe nekir û mîrzayê biçûk pêşî dudUî bû û paşê bi keservedan dest bi çûyîna xwe kir. Wê gavê qiral bi lez dengê xwe bUind ldr:

-Ez te dikim sefîrê xwe.

Nîşanên desthUatîyê baş li ser rij^ê wî xuya bûn.

Omîrzayê biçûk di hemû dirêjahiya rêwîtiya xwe de ji xwe re got: "Mirovên mezin gelekî seyr û xerîb in."

48

XI

Mirovekî pir jixwehiz li ser gerestêra duduyan çHjiya:

-Va ye hejmetkarek tê seriêdana min!

Wî wUo got ji t)er ku ji bo mirovên xwebîn, jixwehez, hemû mirovên din hejmetkarên wan in.

Mîrzayê biçûk got:

-Roj baş. Kumetê te xerîb e.

Mirovê xwebîn vegerand:

-Ew ji bo sUavldrinê ye. Ew ji bo sUavkirinê ye gava xelq ji min re li çepikan dixin. Lê mixabin kesek di vê derê re derbas nabe.

Mîrzayê biçûk têngihaşt û vegerand:

-Belê?

49

-Li çepikan bixe, mirovê xwebîn ev pêşniyarî kir.

Mîrzayê biçûk rabû li çepikan xist. Yê xwebîn rabû bi nefsbîçûkî kumê xwe bUind kir û wUo jî silav kir.

Mîrzayê biçûk di nava xwe de ji xwe re got:

-Ev yek ji serlêdana yê qiral xweştir e.

Owî dîsa li çepUcan xist. Yê xwebîn dîsa kumê xwe ji bo silavkirinê bUind kir.

Wî karî pênc deqan dirêj kir û paşê diîê mîrzayê biçûk ji wê lîstUcêsbû. Wîpîrsî:

O -ta ku kum bUceve, gerek ez çi bUdm?

Lê deng neçû yê xwebîn. Mirovên xwebîn tenê li pesin û şabaşiyên guhdarî dikin.

Wî ji mîrzayê biçûk pîrsî:

-Ma bi rasrî tu wiqasî hejmetkarê min î?

-Meneya hejmetkariyê çî ye?

-Meneya hejmedcariyê ew e ku tu bizanibî ku mirovê herî xweşUc, herî bi cilên Hhevhad, herî dewletmend û herî jîr li ser gerestêrê ez im.

-Lê ji biH te ii ser gerestêrê kesekî din tune?

-Kêfa min bîne. Ne xem e. Dîsa hejmedcariya xwe ji min re bide xuyakirin!

Mîrzayê biçûk got û miiê xwe hinekî hejand:

-Ez hejmedcarê te me. Lê fêda vê yekê wê li te çî be?

50

/

I Ûmîizayêbiçûk birêyaxwedeçû.

" /Eşkere ye ku mirovên mezin gelekî seyr û xerîb in", wî bi 'şêweyekî sade di hemû rêwîtip xwe de ev yek ji xwe re got.

XII

Li ser gerestêra din meyxurek hebû. Ev serlêdana hanê erê gelekî kurt bû, lê belê wê mîrzayê biçûk di nav xemgîniyek mezin de hişt.

Mirovê meyxur li ber qeyametek şûşên vala û qiyametek şûşên d'irtî rûniştî bû. Mîrzayê biçûk jê re got:

-TuHvêderêçidUcî?

Yê meyxur bi mirûzekî tal lê vegerand:

-Ez vedixwim.

Mîizayê biçûk jê pirsî:

-Çima tu vedixwî?

Yê meyxur lê vegerand:

-Ta ji bîr bikim.

DUê mîizayê biçûk hingê bi rewşa wî mirovê hanê dişewitî.

-Ta tu çî ji bîr bikî?

Yê meyxur got:

-Ta ku ez ji bîr bUdm ku ez şerm dUdm. U wî serê xwe berda ber xwe.

-Şermkirina ji ber çî? mîrzayê biçûk ev pirs kir û dixwest bi  
51

gaziya wî mirovî bihata.

Yê meyxur got:

-Şerma vexwarinê! Ê paşê wî ji binî ve nema dengê xwe kir.

Ê mîrzayê biçûk, heyrî, ji xwe re di hemû dirêjahiya rêya xwe de got: "Mirovên mezin bi rastî gelekî gelekî seyr û xerîb in.

XIII

Gerestêra çaran ya mirovê karferma -biznisman- bû. Vî mirovî wîqasî xwe di nav karên xwe de wînd kiribû ku wî serê xwe bUind neidr gava mîrzayê biçûk hat bal wî.

Mîrzayê biçûk jê re got:

-Roj baş. Çixara te vemirî ye.

-Sisê û dudo dibin pênc. Pênc û heft dibin duwanzdeh.

Duwanzdeh û sisê panzdeh. Roj baş. Panszdeh û heft bîst û dudo. Bîst û dudo û şeş bîst û heşt. Wextê min ttme ez wê vêxînim. Bîst û şeş û pênc sî û yek. Of! Ev wUo dibe pênc sed û yek mUyon şeş sed û bîst û du hezar û heft sed û sî û yek.

-Pênc sed milyon çî^ ?

\*5

-Çî? Tu hêna li vê derê yî? Pênc sed û yek mUyon ji... Ez nema dizanim...Xwedêyo çî Icarê min pir e! Ez, ez miroveld

cedî me, ez wextê bi tiştên vala winda naldm! Du û pênc heft...

Mîrzayê biçûk di temenê xwe gişt de ji dû pirsekê tucarî venegeriyabû.

WUo jî wî pirsî xwe dubare idr:

-Pênc sed û yek mUyon çi?

Yê Icarferma serê xwe bilind Idn

-Pêncî û çar salên min ii ser vê gerestêrê çêbûne û cU van salan gişt de tenê ez sê caran hatime aciz kirin. Cara pêşîn berî bîst û du salan bû û ew ji ber mozqirtekê bû ku Xwedê tenê cUzanîbû ew ji ku derê hatibû. Wê bi vinevina xwe ya geleid ne xweş ez gêj kirim û min di berhevkirinekê de çar çewtî kirin. Cara duduyan berî yanzdeh salan bû bawîbûna min xurt bûbû. Ez geleid nalivim. Wextê min û gerrê tune. Ez cedî me, ez. Cara sisi)^... va ye! Min digot pênc sed û yek mUyon...

-Milyonên çi?

Yê karferma têgihaşt ku xelasiya wî ji ber serê mîrzayê biçûk timebû û got:

-Milyon ev tiştên biçûk ku carinan mirov wan H asmanan dibînin.

-Mêş?

-Na, ne mêş, ew tiştên biçûk ên ku diçirisînin.

-Mêşên hinguv?

-Na, ne mêşên hinguv, ew tiştên biçûld zêrînê ên ku cUhêlin ku kesên tembel xwe di nav xewnan de winda bikin. Lê ez, ez mirovekî cedî me! Wextê min ji bo xewnên vala time.

-Ha! stêrUc?

-Belê. StêrUc



-Û tu çî dild ji van pênc sed milyon stêrikan?

-Pênc sed û yek milyon şeş sed û bîst û du hezar heft sed û sî û yek. Ez cecû me, ez, pir deqîq im.

-Û tu çî dild ji van stêrikan?

-Çawa ez çî dikim ji wan?

-Erê, tu çî dUd ji wan?

-Hîç. Ez xwecUyê wan im, bes e.

-Na xwe wilo stêrik malên te ne?

-Belê.

-Lê min qiralek çHt û wî...

-Qiral ne xwediyê tu rişti ne. Ew tenê li ser tiştan "hukum" dikan. Ev herdu tişt gelekî ji hev cihê ne.

-Û fêda wê çî ye ku wiqas stêrikên te hebin?

-Ew dihêlin ku ez zengîn bibin.

O -fêda wê çî ye ku tu zengîn bî?

-Fêda wê ew e ku ez dikarim stêrUdne din bildrim, eger kesek wan peyda bike.

Mîrzayê biçûk di nava xwe de ji xwe re got ku ev yê hanê bi çavên mêyxureld serxweş tiştan dibîne.

Lê belê wî dîsa pirs kirin:

-Çawa mirov dikare bit)e xwediyê stêrikan?

-Ma ji te we re ew wUo berdayî û bêxwedî ne? karferma bi mirûzeld tal vegerand.

-Ez nizanim. Ew ne yê tukesî ne.

-Wê gavê ew yên min in, ji ber ku ez mirovê pêşîn bûm ku ez bi wan fildrîm.

-Ma ev yek bes e?

-Helbet! Gava tu almasekê bibînî û ew ne ya tukesî be, ew

ji te re ye. Gava tu giravekê bibînî û ew ne ya tu kesî be, ew ji te re ye. Gava fdcroke ji bo cara pêşîn cU serê te de çê bibe, tu dikarî wê qeyd bikî û ew dil) e ya te. Stêrik jî yê min in ji ber ku berî min keseld bîr nebiribû wan bike yê xwe.

54

Mîrzayê biçûk got:

-Ev yek rast e. Ê tu çî dikî ji wan?

Yê karferma got:

-Ez wan îdare dUdm. Ez wan dijmêrim û dijmêrim. Ev zehmet e. Lê ez miroveld cedî me!

DUê mîrzayê biçûk hêna neketibû cîh.

-Yê min bi xwe, eger mUpêçek min hebe, ez dikarim wê li dora qirika xwe girêdim û wê bi xwe re bigerînim. Yê min bi xwe eger gideke min hebe, ez dUcarim wê biçînim û wê bi xwe re bibim. Lê tu, tu nikarî stêrikên xwe bidî hev!

-Na, lê ez dikarim wan di bankê de têxim ser hesabê xwe.

-Meneya vê yekê çî ye?

-Meneya vê yekê ew e ku ez li ser kaxezek biçûk hejmara stêrikên xwe dinivîsînim. Paşê ez vê kaxeza hanê dixim çaviyekê û Idîît dikim.

-Hew wiio?

-Ev bes e!

Tiştêkî xweş e, mîrzayê biçûk di serê xwe de ji xwe re got.

Ev riştêkî têra xwe helbestî, şayirane ye. Lê belê bi rastî ne cedî ye.

Nêrîn û dîtinên mîrzayê biçûk li ser tiştên cedî geled cihê bûn ji dîtin û nêrînên mezinan. Wî dîsa got:

-Ez bi xwe xweçHyê gulekê me û her roj wê avdidim. Ez

xwecHyê sê agirfişanan im û ez her hefte argûnên wan paqij dUdm. Ji bîr meke ku ez ta yê vemirî jî paqij dikim. Kî dizane. Ji bo agirfişanên min û giUa min ew tişteld baş e ku ez xwecUyê wan bim. Lê tu tu fêdê nagihînî stêrikan...  
Karferma devê xwe vekir lê nizanîbû çawa vegeranda. Mîrzayê biçûk ji xwe re di hemû dirêjahiya rê de digot ku mirovên mezin bi rasti t)êtixûb seyr û xerîb in.

55

XIV

Gerestêra pêncan gelekî balkêş bû. Ew di nav gişan de ya herî biçûk bû. Li ser wê tenê ciyê stûnê çirakê û rohnîldrê çiran hebû. Mîrzayê biçûk nUcarîbû têbigUiaşta fêda stûneke çirayê û rohnîldrekî çiran di wî asmanê fireh de, li ser gerestêrek bêkes û bêxanî çî bû. Lê l)elê wî ji xwe re got:

-Belkî ev mirovê hanê mirovekî tewş û gêj be. Lê çawa be, ew ji qiral û xwebîn û karferma û ji meyvexur ne tewş û gêjtir e. Bi kêmanî meneyeke ji lcarê wî re heye. Gava ew çira xwe vêdixe, ew wek ku stêrike cUn an guleke din diaferîne. Gava ew çira xwe vedimirîne, ew gulê an stêrê di xwe re dUce. Ev karûbarekî xweşUc e. Ev bi rastî hêja ye ji ber ku ew xweşUc e. Gava ew dalcet ser gerestêrê, wî bi rûmeteke mezin sUav li rohnakirê çiran ldn

-Roj baş. Çima te anuha çira xwe vemirand?

Rohnîkerê çiran vegerand:

-Destûra kar ev e. Roj baş.

-Kar çî ye?

-Vemirana çira min e. Şevbaş, yê rohnîkirî vegerand.

Owî dîsa çira pêxist.

-Lê çima anuha te ew dîsa pêxist?

Rohnîkerê çiran vegerand:

-Destûra icar ev e.

Mîrzayê biçûk got:

-Ez têngihêjim.

Rohnikerê çiran got:

-Ma çi heye ta ku tu bixwazî têngihêjî? Destûra kar destûra kar e. Roj baş.

Owî çira xwe vemirand.

Paşê wî xwêdana aniya xwe bi destmaleke bi damikên sor zuha kir.

56

-Karê min kareld pir dijwar e. Berê ew karek bû ku diket seriyar. Min sibehê vedimirand û êvarê pêdixist. WUo jî di saetên mayîn ên rojê de min xwe rehet dUdr û di saetên mayîn ên jevê de min ji xwe re xew fikir...

-Û, ji wê demê de destûra icar hate guherrin?

Rohnikerê çiran got:

-Destûra icar nehatiye guherrin. Ji )cwe t)eia mezin ev e!

Gerestêrê sai bi sai zûrir ii dora xwe geriya û destûra kar nehat guhertin!

\

4î

c

\, /

/

y

l

\\

\

cy

57

Mîrzayê biçûk goc

-Vêcaçi?

-Vêca anuha ku ew her deqê carekê H dora xwe digere, ez nUcarim saniyekê çi ye ji xwe re rûnêm. Ez di her deqê de carekê vêdixim û careke vedimirînim!

-Ev rişt bi rastî seyr û xweş e! Na xwe roj li bal te tenê deqakê dirêj dikin.

Rohnîkerê çiran got:

-Ev tişt bi rasti yekcar ne seyr e û ne xweş e. Ev meheke me ye ku em bi hev re diaxivin.

-Te got mehelc?

-Belê. Sî deqe. Sî roj! Şev baş.

Û wî dîsa çira xwe pêxist.

Û mîrzayê biçûk li rohnîkerê çiran nêrî û kêfa wî jê re hat.

Wî ji karkerê wefadar hez kir. Roavaçûyînên ku berê ew H wan digeriya û ji bo wan wî sendeliya xwe dikişand harin bîra wî. Wî xwest alîkariya hevalê xwe bikira:

-Tu dizanî... Ez çareyekê ji bo te nas dikim û dizanim çawa tu ê bikaribî xwe rehet bUcî her gava ku dilê te bixwaze.

Rohnîkerê çiran got:

-Ez vê yekê heibet dixwazim, de ka bêje çi ye.

Wî got ji ber ku mirovê wefadar dibe ku di eynî wextê de jî mirovekî tembei be.

Mîrzayê biçûk berdomand:

-Gerestêra te pir biçûk e û bi sê gavan tu dikarî ii dorê bigerî.  
Tu dikarî tenê hêdî hêdî ji xwe re bimeşî û wUo jî wê  
herdem ii ber te roj be. Gava tu bixwazî xwe rehet bUd, tu ê  
bimêşî Û...Û roj ê li gor daxwaza te dirêj bibin.

-Ev yek birîna dUê min derman nake. Li ser rûyê dunyayê,  
tiştê ku ez jê hez dildm, tenê xew e.

Mîrzayê biçûk got:

58

-Bextê reş reş e.

Rohnîkerê çiran got:

-Bextê reş reş e. Roj baş.

Û wî çira xwe vemirand.

Mîrzayê biçûk paşê di dirêjahiya rêwîriya xwe de got: "Ev ê  
hanê wê di çavên gişan de biçûk bibe. Ew ê di çavên qiral,  
jbcwehez, meyxur û karferma de wê biçûk bibe. Lê belê di nav  
wan de ew yê yekêmin e ku kenê min pê nayê. Belkî ji ber ku  
ew ne bi nefsa xwe lê bi tişteki din xerUc dibe.

Bi poşmanî, wî keserek germ veda û ji xwe re got jî:

-Min tenê ev yê hanê dikarîbû ji xwe re bUdraya heval. Lê  
gerestêra wî bi rastî pir biçûk e û ciyê du kesan li ser tune...

Tiştê ku mîra.yê biçûk bêtir lê poşman dibû û ku nedwêrbû  
ji xwe re bigota, ew bû ku ew li wan hezar û çar sed û çU  
carên ku rok di bîst û çar saetan de diçû ava poşman dibû!

Gerestêia şeşan bi deh caran ji ya berî xwe mezintir bû. Mirovekî,  
Axayekî pîr li ser bû û wî qerasên pimûkan dinivisandin.

Gava ew çav H mîrzayê biçûk ket, wî bi dengê bUind

59

got:

-Va ye cîhangerokekî kaşif!

Mîrzadeyê biçûk li ser masê riinişit û hinekî bêhna xwe vekir.

Ew hingê têra xwe geriyabû!

Axayê pîr jê pirsî

-Tu ji ku derê têyî?

Mîrzayê biçûk got:

-Ev zirqerasa pirtûkê ya çi ye? Hûn li vê derê çi dUdn?

Axayê pîr got:

-Ez coxrafiyazan im.

-Coxrafiyazan çi ye?

-Ew zaneyeke ku ciyê deiyayan, çeman, bajar, çiyên û sehayên nas dike.

Mîrzayê biçûk got:

-Va ye bi rastî tiştê gelekî balkêş. Ev cara pêşîn e ku ez çav li lcareld rastîn çêkevim!

Û wî çavên xwe li hawirdora gerestêra wî coxrafiyazanî gerand.

Wî berê tucarî bi çavên serê xwe gerestşereke wUo xweşik nedîtibû.

-Gerestêra we têra xwe xweşik e. Gelo oqyanos lê hene?

Coxrafiyanas got:

-Ez ê ji ku bizanibim.

-Ah! ODUê mîrzayê biçûk hinekî ma.) O Çiya?

Coxrafiyazan got:

-Ez ê ji ku bizanibim.

O -bajar û çem û sehra?

Coxrafiyazan got:

-Ezê van jî ji ku bizanibim.

-Lê hûn coxrafiyazan in!

Coxrafiyazan got:

-Rast e, lê ez ne kaşif im. Pir karê min bi cîhangerok û kaşifan heye. Ew ne karê coxrafiyazan e ku ew here li bajar û

60

çem û çiya û derya û oqyanos û biyabanan bigere. Rûmeta yê cojcraftîyazan gelekî ji wUo mezintir e ta ku ew here li deran bigere.

Ew ji nivîsgeha xwe nalive. Lê ii wir cUangerok û kaşifan tîn ba wî. Ew pirsan ji wan dUce û têtînan ji ber bîranînên wan digire. O eger bîranînên yekî ji wan bala wî bUdşînin, ew vekoiînekê li ser sinc û axiaqê yê kaşifvedUce.

-Ev ji bo çi?

-Ji l)er ku eger kaşifek derewan bUce, ew ê afetine mezin ji yê coxrafiyazan re peyda bUce. Ê eger kaşifek geiekî ji meyê hez bUce û vexwe.

-Ev ji bo çi?

-Ji ber ku yên serxweş cot dibînin. Wiio jî, yê coxrafiyazan di şûna çiyakî de ê duduyan binivîsîne.

-Ez yekî nas dikim û dizanim ku ew ê bibe kaşifekî gelekî lcambax.

-Ne dût e. WUo jî, gava yê lcaşif xwediyê sinc û axlaqekî rind be, mirovên coxrafiyazan iêkoiînekê ii ser peydaya wî çêkirin.

-Ew diçin bi çavên serê xwe dibînin?

-Na- Ev yek pir tevlihev e. Lê ji yê cîhangerok têtî xwestin ku ew peydaya xwe baş bipeyitîne. Eger, wek nimûne, ew behsa çiyayeld mezin bike, wê jê bê xwesrin ku ew kevirine mezin bîne.

Coxrafiyazan ji nişkê ve bi dilpekî gî got:

-Lê tu, tu ji dût hatiyî! Tu cîhangerok î! Tu ê ji min re salixdana



gerestêra xwe bidî!

Coxrafîyazan pelekî nû ji defterqeyda xwe vekir û serê qelema xwe baş birrî. Wî paşê got: " Em pêşî biserhatiyên kaşifan bi qelema resas dinivîsîn. Em xwe radigirin ta ku yê ka^if gorinên xwe bipeyitîne, ta ku paşê, em wan gorinan bi hibrê binivîsîn.

Coxrafîyazan xwest:

6i

-Fermo de lca bêje!

Mîrzayê biçûk got:

-Ez ê çi t)êjim? gerestêra min ne wîqasî balkêş e. Ew gelekî biçûk e. Sê agirfişanên min hene. Dudo ji wan vêketi ne û yek vemirî ye. Lê mirov tucarî baş nizane.

Coxrafîyazan got:

-Mirov tucarî baş nizane.

-GiUeke min jî heye.

Coxrafîyazan got:

-Em gidan qeyd naldn.

-Çima na! Tiştê hemû xweşik ji xwe ew e.

-Ji l)er ku gul yekrojane ne.

-Meneya "yelcrojane" çi ye?

Coxrafîyazan got:

-Pirtûkên coxrafîyazanan ji hemû pirtûkên din çêtir û giranbuhatir in. Ew tucarî kevin nabin û ji rûmeta xwe nakevin.

Ew gelegekî kêr e ku çiyak rojekê ciyê xwe biguherîne. Ew pir kêr e ku ava oqyanosekê bimiçiqe. Em bi xwe tiştên nemir dinivîsîn.

Mîrzayê biçûk gotina wî birrî:

-Lê agirfîşanên vemirî dikarin rojekê şiyar bibin. Meneya "yekrojane" çi ye?

Coxrafîyazan got:

-Agirfîşan çi vemirî çi pêked, ew bi xwe ji bo coxrafîyazanan welchev in. Çiya ji bo me girîng e. Ew nayê giUertin.

Mîrzayê biçûk di temenê xwe giştî de gava pirsek fikir ew tucarî ji dû wê pirsê venedigeriya Wî pirsar xwe dubare idr:

-Lê meneya "yekrojane" çi ye?

-Meneya wê "Tiştê ku dibe çH demeke nêzîk de ji ber çavan winda bibe".

-GiUa min na xwe dibe ku di demeke nêzîc de ji ber çavan winda bibe?

6x

-Heibet.

Mîrzayê biçûk ji xwe re got: "GiUa min yekrojane ye û ji bUî her çar stiriye wê tiştêkî wê din tune ku wê biparêze! Wax li min! Min ew bi tenha serê wê ii bal xwe hiştiye"!

Ew cara yekem bû ku poşimanî çH nava wî de peyda dibû.

Lê wî diîê xwe xurt kir:

-Hûn ê pêşniyariyê kîjan deverê li min bUdn ku ez biçim wir?

-Gerestêra Erdê, coxrafîyazan lê vegeand. Navûdengê wê bi başiyê derkeriye...

Û mîrzayê biçûk, gula wî hergav di bîra wî de, bi rêya xwe deçû.

XVI

Gerestêra hefian wilo jî Erd bû. Erd gerestêreke ne wek her gerestêrê ye! Li ser Erdê sed û yanzdeh qirai hene (Heibet bê

ku ez qiralên reşan ji bîr bildm), heft hezar coxrafîyazan hene, neh sed hezar karferma hene, heft milyon û nîv meyxurên serxweş hene, sê sed û yanzdeh milyon jixwehez hene, ango bigîştî, nêzîkî du milyar mirovên mezin li ser rilyê Erdê hene. Ta ku ez nêrînekê di serê we de ii ser mezinbûna Erdê çêbikim, ez ê ji we re bêjim ku berî derketina eietrîkê, li ser her şeş qareyên wê ordiyek ji çar sed û şêst û du hezar û pênc sed û yanzdeh rohnîkerên çiran hebûn û wan rohnîkeran nanê xwe ji karê xwe dixwarin.

Gava yekî hinekî ji jor ii tevgerên van ieşkeran binerîya, dîmeneke gelekî xweşUc jê re xuya dibû. Tevgerên vê urcUyê giş bi dûzan û des^eh bûn û mîna endamên dUaneke operayê her yekî karê xwe dikir. Pêşî dibû dora rohnUcerên çirayên Ze-63

landa Nû û Austiraliyayê. Piştî ku van rohnîkeran fanosên xwe vêdixistin, ew diçûn ji xwe re radizan. Pa^ rohnîkerên Çînê û Sîbîryayê dUcerin govendê û pişti ku wan çirên xwe vêdixitin, ew li pişt perda teatroyê winda dibûn. Paşê cUbû dora rohnUcerên çirên Rûsiya û Hindistanê. Paşê yên Afriqa û Europayê. Paşê ên Amerîka Başûr. Paşê yên AmerUca Bakur. O wan tucarî xwe di newbeta derketina xwe de ser sehnê şaş nedUdrin. Ew tişt bêpîvan dUrevîn bû.

Tenê rohnîkerê çira tek ya qutbê Bakur û hevkarê wî yê çira tek ya qutbê Başûr jiyaneke tembelî û bêlcarî derbas dikirin: Wan di salê gişî de tenê du caran kar dUdrin.

XVII

Gava yek bixwaze xwe pir jîr û zane bide xuyakirin, dibe ku ew carinan derewan jî bike. Gava min behsa rohnîkerên çiran

Idr, ez bi we re ne gelekî rast û dilpaqij bûm. Dibe ku ez nêrînên çewt li ser gerestêra me bidim kesên ku wê nas nakin.

Ger herdu miyardên ku li ser rûyê erdê dijîn şipya û hinekî bi ser hev de, wek di civîneke siyasî de guvaştî bin, ew ê bi hêsanî têkevin meydana umûmî bi dirêjbûn û bi pehnbûna bîst hezar mUî. Mirov ê bikaribe hemû mirovên ii ser rûyê erdê têxe girava herî biçûk ji nav giravên oc}yanosa Aram.

Mirovên mezin, heibet, wê ji we bawer nekin. Di baweriya wan de ew ciyekî mezin digrin. Ew xwe wek darên baobabê tirtire dibînin. Eger hûn pêşniyariyekê ji wan re bikin û ji wan bixwazin ku ew hesab bildn, ew ji xwe hejmarperest in û bi wê yekê ê pir kêfa wan bê. Lê wextê xwe bi derewan bi teşqeiên vala winda neidn. Baweriya we bi min tê û ev bes e.

Gava mîrzayê biçûk gihast ser rûyê erdê, ew mat ma ji ber ku ew çav li tukeyê neket. Ew hingê dUbitirs bû ku wî xwe Ş3ş

64

o

kiribû û çûbû ser gerestêreke din gava ii ser xîzê xeलेkek di rengê heyvê de iiviya.

Mîrzayê biçûk hema wiio ji l)er xwe ve got:

Şeva te bimîne xweş.

Mar got:

Şeva te bimîne xweş.

-Ez li ser kîjan gerestêrê icetime? Mîrzayê Biçûk pirsî

Mar vegerand:

-Li ser Erdê, ii Afrîqayê.

65

-Na xwe kesek ii ser rûyê Erdê tune?

Mar got:

-Bizanil)e ku ev der biyaban e. Li biyabanan kes tune. Erd mezin e.

Mîrzayê biçûk li ser kevirekê rûnişt û rûyê xwe l)er bi asmanan ve idr.

-Geio stêrUc wUo rohnîldrî ne ta ku her kes bikaribe rojekê stêra xwe bibîne. Li gerestêra min biner. Ew di ser serê me re ye...Lê Xwedê cUzane ew çiqasî dûr e!

Mar got:

-Ew xweşik e. Tu hariyê vê derê çi bikî?

Mîrzayê biçûk got:

-Zehmeriyine min û giUekê hene.

Mar got:

-Na xwe wilo!

Owan nema dengê xwe ldrin.

Pa|ê, mîrzayê biçûk dîsa dengê xwe kir:

-Lê lca insan li kuderê ne? Mirov li sehayê hinekê xwe tenê dibîne...

Mar got:

-Li bal însanan jî mirov xwe tenê dibîne.

Mîrzayê biçûk demeke dirêj lê nêrî:

-Tu jî newerekê seyr û xerîb î. Tu wek tUiyeke zirav î...

Mar got:

-Lê ez ji tUiya qiraleld bihêzrir im.

Mîrzayê biçûk di ber xwe de keniya:

-Bawer meke ku tu wiqasî bihêz î... Nig jî ji te kêr in...

Tu nilcarî dûr jî biçî...

Mar got:

-Ez dikarim ji gemiyekê bêtir te dûr bibim.

Wî xwe li dora gwîzeka mîzayê biçûk mîna xUxalekî zêrînî pêçand. Wî dîsa got:

66

t^;

^":k

67

-Mirovê ku ez destê xwe bidimê, ez wî vecUgerîm axa ku ew jê hariye. Lê tu cUIpak î û tu ji stêrekê ketiyî...

Mîrzayê biçûk rişteke venegerand. Mar berdomand:

-DUê min bi te dişewite, tu yî wîqasî qels û belengaz li ser vê Erda kevirên hişk. Ez dikarim alîkariya te bildm eger rojekê tu pir li gerestêra xwe poşman bibî. Ez dikarim...

Mîrzayê biçûk got:

-Baş e, min fêmkir. Lê çima tu herdem bi gotinên sergirtî diaxifî?

Margoc

-Ez dikarim wan gişan vekim û meneya hemû wersiran bidim.

Paşê ew herdu bédeng man.

XVIII

Mîrzayê biçûk çH sehayê re derbas bû û pêigî gulekê hat.

Guleke bi sê peikan, guleke pîsik ku ne hêja bû qirşikekî...

Mîrzayê biçûk got:

-Rojbaş.

GiUê vegerand:

-Rojbaş.

Mîrzayê biçûk bi tore pirsî:

-Ka mirov ii kuderê ne?

GiUê rojeicê, icarwanek cHribû di wê derê re derbas bûbû:

-Mirov? Ez bawer dildm ii ser rûyê erdê ew tenê şeş hefrek in. Berî çend salan ez carekê çav li wan ketim. Lê kesek nizane wan li ku derê zeft bike. Ba wan digerîne. Reh ji wan re ttmene û ji ber vê yekê ew gelekî narehet in.

Mîrzayê biçûk got:

-Xwedê negehdarê te be.

68

/

o

Gulê vegerand:

-Xwedê negehdarê te be.

XIX

Mîizayê biçûk bi çiyayekî beiz û bUind hUkişiya. Çiyayên ku berê wî nas dikirin tenê her sê agirfîşanên wî bûn û ew bi xwe bi zorê digihaştin çoka wî. Û wî agirfîşanê vemirî ji xwe re kiribû sendeU li ser riîdinişt. "Li ser çiyakî wek vî çiyayê bilind, wî ji xwe re wilo got, ez ê bi carekê gerestêrê û hemû mirovan bibînim..." Lê li serê wî çiyayî ew tenê çav li pîjên serê tehtan ket.

Wî hema ji ber xwe ve got:

-Rojbaş.

Sedayê vegerand:

-Rojbaş...Rojbaş...Rojbaş...

69

Mîrzayê biçûk got:

-Hûn kî ne?

Sedayê vegerand:

-Hûn kî ne...hûn kî ne...hûn kî ne...

Wîgot:

-Bibin hevalên min, ez bi tenê me.

Sedayê vegerand:

-Ez bi tenê me...ez bi tenê me...ez bi tenê me.

Mîrzayê biçûk wê gavê di serê xwe de ji xwe re got: "çi gerestêreke seyr û xerîb! Ew wilo zuha, tûj û şor e. Mirovên wê bêxeyal in. Ew hema riştên ku ji wan re tên gotin dubare çHkirin... Li bal min gidek min hebû: herdem ew ya pêfîn bû ku diaxifi"...

XX

Lê piştî ku mîrzayê biçûk gelekî meşiya, piştî ku wî xîz û teht û berf derbas kirin, ew dawiya dawî rastî rêyekê hat. Rê jî ji xwe herdem t)er bi mirovan diçin.

Wîgot:

-Rojbaş.

Ew bexçeke gulan bû. Guian vegerandin:

-Rojbaş.

Mîrzayê biçûk li wan mêze idr. Ew gid hemû wek giUa wî bûn. Wî matmayî ji wan pirsî:

-Hûn kî ne?

Gidan vegerandin:

-Em giU in.

Mîrzayê biçûk got:

-Ha..!

Û wî 5cwe gelekî belengaz dît. Gula wî jê re gotibû ku ji tovê

70

wê ew tenê li dunyayê hebû. O va ye ku tenê di bexçakî de,



pênc hezar gulên wekhev û wek wê, hebûn!

Wî ji xwe re got: "Ew ê dilê xwe bigire eger ew çav H vî  
bexçeyî bikeve... Ew ê geled bêhawe jî bikuxe û ta ku kesek  
pê nekene wê xwe li mirinê deyîne. U ez ê rebenê Xwedê bêgav  
bibim jê re xuya bikim ku ez lê miqate me, ji ber ku eger  
ne wilo be, ta ku ew min bêşîne, ew dikare bi rastî xwe bikuje..."

Paşê wî dîsa ji xwe re got:

"Ji ber giUekê ku min bawer dildr ku wek wê tu giU ttmebûn,  
min jcwê dewletmend didît û ez anuha dibînim ku bi  
rastî bi hezaran gid wek wê hene. Bi ser de jî, bi her sê agirfîşanên  
xwe ên digihêjin çolca min û yê vemirî jî belld tucarî

72

pênekeve, erê bi van hemû riştan mîrzayekî mezin ji min çênabe"...

Owî xwe li ser gUia cHrêj kir û giriya.

)'

XXI

Di wê gavê de bû ku rovî xuya kir û got:

-Rojbaş.

-Rojbaş. Mîrzayê biçûk bi tore vegerand û bê ku çav U tukesî  
biketa wî li dora xwe nerî. Deng hat:

-Ez va me, ez ii bin dara sêvê me...

Mîrzayê biçûk pirsî:

-Tu kî yî? Tu çi xweşik î...

Rovî got:

-Ez roviyek im.

-Were em ji xwe re bi hev re buîzin, mîrzayê biçûk ev pêşniyariya  
hanê lê kir. Ez gelekî duşikestî me...

Rovî got:

73

-Ez niicarim bi te re bUîzim. Ez ne kedîldrî me.

Mîrzayê biçûk got:

-Ah! bibuhmure.

Lê ew ramiya û paşê, wî berdomand:

-Meneya "kedîkirinê" çi ye?

Rovî got:

-Tu ne ji vê derê yî. Tu li çi digerî?

Mîrzayê biçûk got:

-Ez ii mirovan digirim. Meneya "kedîldrinê" çi ye?

Rovî got:

-Mirov xwedî tufeng in û derdikevin nêçîrê. Ev tişteld geield ne xweş e! Ew mirîşican jî xwedî dUdn. Ew tenê guh li vê yekê dUdn. Tu ii mirîşican digerî?

Mîrzayê biçûk got:

-Na. Ez ji xwe re li hevalan cUgerim. Meneya "kedîkirinê" çi ye?

Rovî got:

-Ew tişteld geield kevin bûye û hariye jibîrldrin. Meneya wê "çêkirina pêwendiyên e"...

74

-Çêkirina pêwendiyên?

Rovî vegerand:

-Helbet! Tu hêna ji bo min zarokeld biçûk wek sed hezar zarokên din î. O ez ne bi haced te me. O tu jî ne bi hacetî min î. Ez ji bo te roviyeld wek sed hezar roviyên din im. Lê eger tu min kecH bUcî, her yek ji me ê bi hacetî yê cUn bibe. Tu ê wê gavê ji min re di cîhanê de bibî yekane. Ez ê jî ji te re

bibim yeld yekane"...

Mîrzayê biçûk got:

-Ez nuh têdigihêjim. GiUelce heye...ez bawer dikim ku wê min kedîkiriye...

01»-

.^:.ii.

'Svarr"

75

-Ne dûr e, rovî got. Mirov li ser rûyê Erdê her celebên tiştan çHBîne...

Mîrzayê biçûk got:

-Na! ew ne li ser Erdê ye.

Rovî hinekî matbû:

-Li ser gerestêreke din?

-Erê.

-Li ser wê gerestêrê nêçîrvan hene?

-Na.

-Va ye tişteki xweş û balkêş! O mirîjk?

-Na.

Rovî bi keser got:

-Mixabin rişteld bê kêmasî tune.

Rovî ji dû hizrekê vegeriya û pirsî:

-Jiyana min î rojane wekhev e. Ez diçim nêçîra mirîşkan, mirov jî tîn nêçîra min. Mirîşk hemû wekhev in û mirov jî hemû wekhev in. Ez wUo jî hineid aciz dibim. Lê eger tu min kedî bild, jiyana min ê giş rewşen û xweş bibe. Ez ê dengê payên te ji nav hemû dengên payan nas bUdm. Dengê payên din ê min têxine binê erdê. Yê payên te ê wek dengê mûzîkê he,

ew ê bang min bike û min ji qidê derxîne. Paşê biner! Tu li wê derê zadan dibînî? Ez bi xwe nan naxwim. Fêda genim nagUiê min. Zeviyên tije gulên genim tişteki ji min re nabêjin.

Ma ev ne dijwar e! Lê porê te di rengê zêr de ye. WUo jî, eger tu min kedî bUd, wê tişteki pir xweş be! GiUên genimên zer ê te bînîn bîra min. O wUo jî ez ê ji xişxişa bê di nava geniman de hez bildm...

Rovî rawestiya û bi dirêjayî li mîrzayê biçûk nêrî. Wî got:

-Ji bo Xwedê tu ê min kedî bUd!

Mîrzayê biçûk vegerand:

-Baş e! Lê pir wextê min tune. Gerek ez ji xwe re hevaian peyda bikim û hînî gelek tiştan bibim.

76

Rovî got:

-Mirov tenê dUcare riştên ku kedî dUce bi rasti nas bUce.

Wextê mirovan ji bo naskirina riştan yekcar nemaye. Ew ji bal cHlcandaran riştên amade û çêkirî dUdrin. Lê ji ber ku dUcandarên ku hevalan difiroşin tunene, ew wilo jî bê heval in.

Eger tu hevlekî dixwazî, min kedî bik!

-Ji bo vê yekê çi gerek e ez bUdm?

Rovî vegerand:

-Gerek tu gelekî bêhnfireh bî. Tu ê pêşî hinekî dûrî min danişî, wUo, di nav gUia de. Ez ê bi qozîka çavên xwe li te binerim û tu ê dengê xwe nekî. Dengkirin çavkaniya şaştêgUiaşrinan e. Lê her roj tu ê bikaribî hinekî nêzUctir danişî...

Roja din mîrzayê biçûk dîsa hat.

Rovî got:

-Ya baştir ew e ku tu herdem cH eynî saetê de \xyî. Eger,

wek nimûne, tu saet çarên piştî nîvro bêyî, ez ê ji saet siyan de dest pê bUdm xwe kêficweş bibînim. Her ku saet nêzîkrir bibe, ez ê wUo xwe bêrir xweşbext bibînim. Saet çar ez ê di nava xwe de bUceim û pirsan ji xwe bUdm; ez ê wiio jî giranbuhayiya bexteweriyê nas bikim! Lê eger tu di çî wextê de bêyî, ez ê nizanibim kîjan saetê diîê xwe ji dîtinê re kok û amede bikim... Rêzik û a)an ji me re divên.

Mîrzayê biçûk pirsî:

-RêzUc û ayîn çî ne?

Rovî vegerand:

-Ev jî rişteke e ku geiekî hatiye ji bîr kirin. Rêzik û ayîn ew in ew tişte ku dihêle ku rojek ji hemû rojên din cihê be, ku saet giş ne wekhev bin. Wek nimûne, rêzUc û ayîn li bal nêçîrvanên min hene. Ew roja pêncşembê bi keçUcên gund re dUanê dUdn. WUo jî, pêncşemb rojek gelekî xweş e! Ez ji xwe re ta rezan cUgerim. Eger nêçîrvan kengî bûya dUana xwe bUdrana, rojê giş wek hev bûna û rojên tatUê ê ji min re timebûna

77

WUo jî mîrzayê biçûk rovî kedî kir.

Û gava wexta çûyînê nêzîk bû, rovî got:

-Ax U min... Ez ê bigirîm.

Mîrzayê biçûk got:

-Sûc sûcê te ye. Min ji binî ve xirabî ji bo te nedixwest, lê te bi destê xwe mala xwe wêran kir û te xwest ku ez te kedî bikim...

Rovî got:

-Helbet min xwest.

Mîrzayê biçûk got:

-Ma ne tu ê bigirî.

Rovî vegerand:

-Heibet ez ê bigirîm.

-Ka te çi fêde lçir?

Rovî got:

-Belê, bi saya rengê geniman min fêde kin

«7

Paşê wî berdomand:

-Here dîsa li gulan binere. Tu ê têbigUiêjî ku gida te cU cîhanê gişî de gideke yekane ye. Tu ê paşê beyî xarir ji min bixwazî û ez ê wê gavê wek xeiatê tişteld xwe ji te re bêjim.

Mîrzayê biçûk rabû çû dîsa guian bibîne. Wî ji wan re got:

-Hûn yekcar ne wek gida min in, hûn hêna ne tiştekin.

Ne kesekî hûn kedî kirine û ne we kesek kedîdriye. Roviye min berê çawa bû hûn jî anuha wUo ne. Ew roviyekî wek sed hezarên roviyan bû. Lê min ew ji xwe re kir heval û anuha jî wek wî di bin stûna asmanan de rovî timene.

Ogulan nizanîbûn çi bigotana.

Wî hêna ji wan re got:

-Rast e ku hûn xweşik in, iê hûn vala ne. Mirov nikare xwe ji bo xwe bide kuştin. Gula min ji bo rêwiyeid wek hemû rêwiyan helbet ê guleke wek we be. Lê ew bi tenha serê xwe ji we hemûyan çêtir e ji ber ku ew e ya ku min ew bi destên xwe av da. Ew birûmetir e ji ber ku ew e ya ku min ew xist bin camê. Ji ber ku ew e ya ku min bi surreperdeyê parast. Ji ber ku ew bû ya ku ji bo wê min kurmik kuştin (ji bUî du-sê kurmikên ku min hiştin ta ku bibin pinpinîk ). Ji l)er ku ew e ya ku min li gizin û pesindan û ta li bêdengiya wê guhdarî ldr. Ji t)er ku ew giUa min e.

Û ew vegeriya bal rovî...wî got:

-Xwedê negehdarê te t)e...

Rovî got:

-Xwedê negehdarê te be. Va ye sirra min, ew bi xwe geled sade ye: Mirov tenê bi dUê xwe dilcare baş bibîne. Tiştên bingehîn bi çavan nayên dîtin.

Ta ku ew tişt cU bîra wî de bimaya, mîrzayê biçûk ew dubarekin

-Tiştên bingehîn bi çavan nayên dîtin.

-Wextê ku te di ber gula xwe de winda kiriye ew e ku dihê-

79

le ku hemû rûmeta wê giUê çêbibe.

Mîrzayê biçûk got ta ku cH bîra wî de bimaya;

-Wextê ku min di ber gula xwe de winda kiriye...

Rovî got:

-Mirovan ev rasriya hanê ji bîr kirine. Lê gerek tu wê ji bîr nekî. Gava tu tişteki kecH dUd, tu ji bo hergavê dimînî berpirsyarî wî rişd. Tu berpirsayarê gida xwe yî...

-Ez berpirsyarê gula xwe me...mî2ayê biçûk dubare kir, ta ku ew yek cH serê wî de bimaya.

XXII

Mîrzayê biçûk got:

-Rojbaş.

şujivanê reyên hesinî vegerand:

-Rojbaş.

Mîrzayê biçûk pirsî:

-Tu li vê derê çi dUd? Şujivanê reyên hesinî vegerand:

-Ez rêwîyan ji nav hev vecUqetinim, ez wan dikim qeflên hezar neferî. Ez trênen ku radihêjin wan geh bi aliyê rastê, geh

bi aliyê çepê, bi rê dildm.

Û zûtrênek bi pencerên rohnî wek birûskê derbasbû û guregura awran hişt ku oda sazidrina tevgera tirênan bUeriziya.

Mîrzayê biçûk got:

-Ew geield bUez in. Ew li çi digerin?

Şûjinvanê riyên hesinî vegerand:

-Şufêrê rirênê bi xwe jî nizane.

Ozûtrênek din bi camên rohnî ji aliyê din hat û kir guregur.

Mîizayê biçûk pirsî:

-Ew çi zû vegeriyan...

80

Şûjinvanê rêyên hesinî got:

-Ew hinin din in. Ew dikevin şûna yên çûyî.

-Çima" ma ew ne kêficweş bûn li dera ku lê bûn?

Şûjinvanê rêyên hesinî got:

-Mirov tucarî ne kêficweş e li dera ku lê ye.

Ozûtrêneke sisiyan bi pencerên rohnî derbas bû.

Mîrzayê biçûk pirsî:

-Ew cUdin dû rêwiyên pêşîn?

Şûjinvanê reyên hesinî got:

-Na xêr, ew nadin dû tukesî. Ew di himdirê trêne de razayî ne an jî bawîşld dibin. Tenê zarok pozên xwe U ser camên penceran diperçiqînin.

Mîrzayê biçûk got:

-Tenê zarok dizanin li çi digerin. Ew wextê xwe bi bûkeke paçiid winda dikan û wiio jî ew bûk di çavên wan de bi rûmet çHbe. Eger yek wê bûkê ji destên wan derxîne, ew cUgirîn...

Şûjinvanê rêyên hesinî got:



-Ew bextewer in.

^■i'-^f-

(" ' ':^-\_ ' . :- --- --" ^.

o'." ,. \ / ^ \ 1. ■/^■~, >a^ . V-'

8i

XXIII

Mîrzayê biçûk got:

-Rojbaş.

Yê dikandar vegerand:

-Rojbaş.

Wî hebine ku ji bo şUcenandina tînê hatibûn çêkirin difirotin.

Mirov dUcarîbû cU hefteyê de tenê hebek bixwara û nema zanîbû tîbûyîn çi ye.

Mîrzayê biçûk got:

-Çima tu vî riştî difiroşî?

-Mirov dikare qeyametek wext fêde bike. Li gor hesab û îêkoîînên pisporan, mirov dikare bi van heban di hefteyê de pêncî û sê deqan fêde bike.

-Ma mirov ê çi bike ji wan pêncî û sê deqan?

-Ew dikare hezar riştî bike...

Mîrzayê biçûk ji xwe re got: " Eger pêncî û sê deqe li ber min vala hebin, ez ê wan bi çûyîna ber bi çavkaniyê derbas bikim"...

XXIV

Heyşt rojên me li sehayê di ser xerabûna motorê balafîra min de derbas dibûn û min li çîroka yê mirovê hebfiroş guhdarî kiribû gava min dUopa dawîn ya ava xwe vexwar. Min ji mîrzayê biçûk re got:

-Belê, bîranînên te geiekî xweş in lê mixabin ne min motorê

xwe dirilst kir û ne jî ava min ma. Ez ê jî kêfîcweş bim eger ez wiio hêdîka berê xwe bidim çavkaniyekê! Wî ji min re got:

-Hevalê min î rovî...

-Kuro dev çîroka rovî-moviyana berde!

82

-Çima^

-Ji ber ku bê av em ê ji tîna bimirin...

Ew cH gotinên min negihaşt û li min vegerand:

-Eger mirov ii ber mirinek nêzîk t) e jî ew dîsa tişteld xweş e ku hevaleyê wî be. Ez bi xwe geield kêfîcweş im ku roviyek hevalê min e...

Min ji xwe re got: "Malavayo bîr nabe çi xeter li ber wî heye.

Ew tucarî ne ti ne birçî dibe. Tenê hinek rok besî wî ye...

Lê wî li min nêrî û wek ku hizra min di serê min de bixwenda got:

-Ez jî tî me... Heydê em li bîrekê bigerin...

Min ji bêzariyê nizanîbû çî bikira çî nekira: ew tişteld gelekî dûrî aqUan e ku mirov di mezinbûna bê serî û bê binî ya sehayê de wUo bi kwîranî li bîrekê bigere. Lê belê me dest bi meşê kir.

Gava em bi saetan bêdeng meşiyana, şev ket û stêran dest pê-

ldrin rohnî kirin. Ji ber tîbûnê tayê hinekî ez girribûm û ew

stêrik li ber çavên min mîna di xwenek şevan de xuya cUbûn.

Gotinên mîrzayê biçûk di bîra min de dUan dikirin:

Min jê pirsî:

-Na xwe tu jî tî yî?

Lê wî bersiva pirsê min neda. Wî tenê ji min re got:

-Av dibe ku ji bo dU jî baş û giring be...

Ez di bersiva wî de negihaşrim lê min dengê xwe nekir...

Min dizanîbû ku gerek min tu pirs jê nekirana.

Ew westiyayî bû. Ew rûnişt. Ez li kêleka wî rûniştim. O pişd bédengiyekê, wî dîsa got:

-Stêr ji ber guleke ku nayê cHtin wUo xweşUc in...

Min vegerand "helbet" û bê ku min dengê xwe bUdra min li ber tava heyvê li qermîçokên li ser rûyê xîzê nêrî. Wî berdomand:

-Sehra xweşik e.

83

Û ew yek rast bû. Min ji roja roj ji sehayê hezdikir. Mirov lê li ser girikek xîzê rûdinê. Ew rişteki nabîne. Ew dengê rişteki nake. Lê belê ji wê t)êdengiyê wek rohniyekê derdikeve û belav dibe... Mîrzayê Biçûk got:

-Tiştê ku dUiêle sehra xweşUc be, ew e ku li derekê ji derên wê bîreke veşartî heye...

Ez mat bûm ji ber ku ji nişkê ve ez di wê ronahiyê de gUiaştim.

Di zaroktiya xwe de ez di xaniyeid kevin de bûm û dihat gotin ku gencîneyeke, xezîneke veşarti cH wî de hebû. Heibet kesekî tucarî ew nedîtibû û beUd jî kesek tucarî jî negeriyabû. Lê belê hebûna wê efsanê rohniyek veşartî dida wî xaniyê hanê.

Di kûraniya diîê xaniyê min de, surreke veşartî hebû...

Min ji mîrzayê biçûk re got:

-Erê, rast e. Çi di xanî de, çi ii ser stêrikan, an jî çi ii sehayê, riştên ku wan wiio xweşik dikin bi çavan nayên dîtin! Wî got:

-Ez kêficweş im ku tu û roviyê min hûn li hev dikin.

Ji ber ku mîrzayê biçûk di xew re diçû, min ew xist hembêza xwe û dîsa rêya xwe ajot. Wî dUê min gelekî tenUc Idribû ji

ber ku gava ew çH hembêza min de bû, ji min re xuya bû wek ku min gencîneyeke pir nazUc û zûşikest hUgirtibû. Ji min re xuya jî bû ku li ser rûyê Erdê, ji wê gencîneyê naziktir û zûşikestir tunebû. Min li ber tava heyvê li wê aniya spî, li wan çavên girtî, li biskên porê ku li ber bê diieriziyan dinêrî. Û min ji xwe re digot: "Tiştê ku ez anuha bi çavên xwe dibînim tenê qalik e, qaşir e. Tiştê bingehîn nayê dîtin"...

Ji ber ku li ser lêvên wî nîvgirti nîvkenek hebû, min ji xwe re got: "Tiştê ku di vî mîrzayê biçûk de agir berdide nava min wefadariya wî ji bo gulekê ye, wêneya gulekê cU nava wî de, ta di xewa wî de jî, mîna pêtên lempekê rohnî dide..." Min dizanîbû ku ew gelekî nazUc û zûşUcest bû lê min nizanîbû ku ew

84

bêpîvan wilo bû. Gerek mirov baş çiran biparêze: surrek ba dikare wan vemirîne...

tJ ez wUo dimeşiyam gava di destê sibehê de ez rastî bîrekê hatim.

XXV

Mîrzayê biçûk got:

-Mirov xwe dixin huncUrê zûtrênan, lê nema dizanin ka li çi cUgerin. WUo jî ew hema derin û tèn û li dora xwe dizîvirin.

Owî berdomand:

-Nehewceye...

Bîra ku em gUia<sup>^</sup>ibûnê ne wek bîrên li sehayê bû. Bîrên sehayê tenê qideke di nava xîzê de kolayî ne. Ew bîra hanê wek bîrên gundan bû. Lê belê li wê derê tu gimd tunebû û min bawer dikir ku ew xewnek bû. Min ji mîrzayê biçûk re got:

-Çi tiştêkî seyr! Her tişt amede ye: çirik, dewl û werîs jî...  
Ew keniya, wî destê xwe dirêjê werîs kir û bi çirUcê lîst û ew  
bir û anî. Ê çirUc naliya. Ew bû wek banemeke kevin gava ba  
wexteke pir dirêj di xewê de dimîne. Mîrzayê biçûk got:  
-Deng tê te? Em bîrê ji xew radUdn û anuha ew distirê...  
Min nedixwest ku wî xwe bêşanda û av bikişanda. Min jê re  
got:

-Bihêle! Ew ji bona te gelekî giran e.  
Min dewla avê hêdîka ta ber devê bîrê hiUdşand. Min ew  
xweşik danî ser kêleka bîrê. Di guhên min de sdrana çirUcê  
hêna dirêj dUdr û min dît ku di ava ku hêna dUeriziya rok jî  
cHlerziya.

-Ez tiyê vê ava hanê me, mîrzayê biçûk got. Ka wê bide  
min ezvejcwim...

85

Omin fêhm kir ew li çi geriyabû!  
Min dewla avê bUind idr û nêzUd lêvên wî kir. Wî çavên  
xwe girtin û vexwar. Ew ava hanê wek şadiya cejneke bû. Ew  
ji adanekê, ji tiştêkî wek xwarin û vexwarine bêrir bû. Ew ji  
meşa di bin stêran de, ji srirana çirUcê, ji hêza destên min çêbûbû.  
Wê, wek xelatekê, dU hêşin û rewşen dUdn Gava ez zarokekî  
biçûk bûm, ronahiya dara Noelê, sirûdên limêja nîvêşevê,  
5cweşîya kenan dihiştin ku xelata Noeiê ya ku digUiaşte  
min rewşen bibûya.

Mîrzayê biçûk got:

-Mirovên ji bai te pênc hezar gulî di bexçekî de diçînîn... û  
di wî bexçî de, tiştê ku iê digerin nabînin...

Min vegerand:

-Ew nabînin...

-Û riştê ku ew iê digerin dikare di giUekê tenê de, di hinek av de xuya bibe.

Min vegerand:

-Helbet!

Omîrzayê biçûk berdomand:

-Lê çav kor in. Mirov gerek bi dilê xwe li tiştan bigerin.

Min vexwaribû. Bêhna min hatibû ber min. Xîz, çH destê sibehê de di rengê hunguv de ye û ez bi wî rengê himguv jî kêficweş dibûm. Lê çima pişti wê kêficweşiyê gerek ez xemgîn bibûma...

Mîrzayê biçûk hêcUka ji min re got:

-Gerek e ku tu soza xwe ji min re bi cUi bild. Ew dîsa li kêleka min rûniştibû.

-Soza çi?

-Tu xweş dizanî... devbendek ji bo bexê min... Ez berpirsyarê wê gulê me!

86

87

Min resmên xwe ên nîvco ji bêrîka xwe derxistin. Mîrzayê biçûk çav li wan ket û bi ken got:

-Darên te ên baobal)ê wek seriyên lehanan in...

-Na!

Min bi xwe gelekî serê xwe ji ber darên xwe bUind dUdr!

-Roviyê te... guhên wî... hinekî wek qUoçan in... û ev guh pir cUrêj in jî!

Oew dîsa keniya.

-Kuro tu li min neheqiyên dUd. Tiştê ku ez hîn bûbûm tenê

nigarên marên boa ên girtî û ên vekirî bûn.

Wîgot:

-Lê ew ne xerab in. Zarok di wan de digihêjin.

Min bi qelema resas bi çend xêzan devbendek çêkin DUê  
min hat gusraştin gava min ew dirêjî destê wî kir.

-Tu ê tiştinan bikî ez nizanim çi ne...

Lê wî bersiva min neda. Wî ji min re got:

-Tu dizanî, di ser roja kerina min ya ser gerestêra Erdê...sibe  
wê salek derbas bit)e...

Pa^, piştî bêdengiyekê, wî car din dengê xwe kir:

-Ez nêzîkî vê derê ketibûm...

Û ew sor bû.

Odîsa, bê ku min bizanîbûya çima, xemgîneke bênav xwe li  
min girt. Lê belê pirseke ket serê min:

-Na xwe tu ne wUo tenha xwe bi kwîranî ji xwe re digeriyayî  
gava berî heyşt rojan me hevdu nas kir û ku tu bi hezar  
hezarên qonaxan ji avahiyên dûr bûyî? Na xwe tu vedigeriyayî  
ciyê ketina xwe?

Mîizayê biçûk çHsa sorbû.

Omin bi ducUlî berdomand:

-Gelo ji het sersaliyê..?

Mîizayê Biçûk car din sor bû. Wî bersiva pirsan tucarî nedida,  
lê, gava mirov sor çUbe, ma meneya wê sorbûyîne ne "erê"

88

ye? Min got:

-Ax! DUê min bitiris e...

Lê wî vegerand:

-Gerek anuha tu kar bUd. Gerek e tu vegeerî cihê mekîna

xwe. Ez ê li vê derê li t)endî te bim. Sibe êvaiê vegere...  
Lê dUê min neketibû cîh. Rovî hate bîra min. Mirov dibe  
ku hinekî bigirî eger wî xwe hiştibe ku kedî bibe...

XXVI

Li kêlelca bîrê, IcaUê dîwarekî Icevirî hebû. Gava ez êvara  
dotira rojê ji Icarê xwe hatim, ez ji dûranî çav li mîzayê xwe  
yê biçûk ketim ew li ser dîwêr bû û wî nigên xwe t)erdabûn  
xwarê.

Û dengê wî gihaste min wî digot:

-Na xwe nayê bîra te? Cî ne eynî cî ye!

Dengekî bêguman lê vegerand, ji ber ku wî paşê got:

-Belê! Belê! Roj ew roj e, lê cî ne eynî cî ye...

Min meşa xwe ber bi dîwêr ve berdomand. Min kesek necU  
û dengê tukesî negihaşt guhê min. Lê he\ê mîrzayê biçûk ji nû  
ve got:

... -Helbet. Tu ê li ser xîzê bibînî şopa nigên min li ku derê  
dest pê dike. Li wê derê li bendî min bimîne, ez ê îşev li eynî  
wê derê bim.

Tenê bîst gavek di navbera min û wî cHwarî de mabûn lê  
min herdem tişteke nedidît.

Mîrzayê biçûk hinekî I)êdeng ma û dîsa got:

-Jehra te ji ya baj e? Tu serrast î ku ez ê demeke dirêj neyêşim?  
Ez di cîh de rawestiyam û dUê min hat guvaştin, lê min herdem  
fêm nedikin Wî got:

-Anuha here... Ez dixwazim dakevim!

89

Wê gavê min li ber nigê dîwêr nêrî û ez ji ciyê xwe peldyam!  
Ez çî bibînim! Mareld zer ji wan marên ku di sî saniyan de dikarin



gayeld bikujin li ber nigê dîwêr bû û serê xwe ber bi mîrzayê biçûk bilind kiribû. Ez li bêrîka xwe li demança xwe geriyam û bêdeng ez nêzîk bûm. Lê mar dengê min ldr û wek ava ku ji erdê bipijiqe û ji nişkê ve bimire, wî marî hêdîka xwe berda xwarê. Wî bi rastî nelezand û xwe di nav keviran de di nav dengê hesinî de winda ldr.

Odi eynî wê wexta ku mîrzayê biçûk dihat xwarê ez gihaş-90

rim ber dîwêr. Rûyê wî wek beifê spî bû û ew ket hembêza min.

-Ev ji te kêma e! Tu anuha bi maran re deng dikî!

Min mUpêça ku jê qut nedibû vekir, hinek av li cênUcên wî kir û ew da vexwarin. Û anuha min nema diwêrîbû tu pirs jê bUdrana. Wî bi giranî li min nerî û destên xwe li dora hustuyê min gerandin. DUê wî mîna çûkeld ku bi xurdoqên tufengê bê xware û H ber mirinê be lêdida. Wî ji min re got:

-Ez kêfîcweş im ku te dît çî cU mekîna te de şUcesti bû. Tu ê bUcaribî vejerî maiê...

-Tu çawa dizanî!

Min dixwest bi rastî ew agahiya hanê biguhesta wî û jê re bigota ku ii gel ku ez tengezar bûm min balafîra xwe çêkiribû!

Wî tu bersiv neda ber pirsê min û berdomand:

-Ez ê jî, îro, ez ê vejerim malê...

Paşê bi diixemgînî:

-Lê ciyê ku ez ê herimê bi gelekî dûrtir e...Çûyîna wê derê geleldijwartire...

Min dizanîbû ku tiştê gelekî seyr li ber rûyê min li wê derê derbas çHbû. Min ew wek zarokê di hembêza xwe de guvaşt,

lê he\ê, \i gel ku min ew wilo xisribû hembêza xwe, ew ji min re xuya bû wek ku ew serberjêr di kunçaleke bêbinî de wercUbû û ji nav destên min derdiket...

Nêrînên wî giran bûn û dûr çûbûn:

-Bexê te bi min re ye...O sindoqa t)erx bi min re ye. Ê devbend bi min re ye...

Ê ew bi xemgînî kenîya.

Min gelekî xwe ragirt. Ez pê dihesiyam ku hin bi hin ruh bi wî ve dihat.

-Lawikê delal, tu tirsyayî ne wUo...

Ew hell)et tirsyabû! Lê hêdîlca kenîya;

-Vê êvarê tirsî min ê t)êtir be...

91

Ez carek din di ciyê xwe de sar bûm û min nizanibû çawa çareyek ji tişteld ku çare jê re timebû peyda bUdra. Ê ez têgihastim ku min nikarîbû filcra ku ew kenê hanê rojekê ê ji ber guhên min biketa qebûl bikira. Ew ji bo min wek çavkaniya aveke zelai di dUê sehayê de bû.

-Lawikê delal, ez dixwazim car din dengê kenê te bikim...

Lê wî ji min re got:

-Îşev, wê salek di ser hatina min re derbas bibe. Stêra min wê li jor di ser serê min re be, di eynî ciyê ku sala çûyî ez lê ketim...

-Lawikê delal, ew xewneke ne xweş e. Bêje ku ev çîrolca mar û soza çûyîne û stêrê xewneke ne xweş e...

Lê wî bersiva pirsî min neda. Wî ji min re got:

-Tiştê bingehîn, nayê dîtin...

-Helbet.

-Wek ji bo giUê. Eger tu ji gulekê hez bUd û ku ew giU li ser stêrikekê he, bi şevan wê bi te xweş be ku tu li asmanan temaşa bild. Hemû stêr giddar dibin.

-Helbet...

-Wek wê ava ku te da min û min vexwar. Ew av ji ber çirikê û wêrîs wek dengê mûzîkê bû...Tê bîra te...Ew xweş bû.

-Helbet.

-Bi şevê, tu ê ji xwe re li stêran binêrî. Cî û warê min gelekî biçûk e ta ku ez bikaribim stêra xwe nîşanî te bidim. Hîn çêtir! Stêra min wê ji bo te stêrek ji stêrên asmanan be. Wilo jî tu ê hez bUd ji xwe re li hemû stêran binerî...Ew ê giş hevalên te bin. O paşê, ez ê xelatekê bidime te...

Oew dîsa keniya.

-Ax!, lawikê delal, ez hez dildm li dengê kenê te guhdarî bidm.

-Ma ne min dixwest ew bi xwe ji te re bikira xelat...Ew ê ji bo te wek avê be...

92

-Ez têngihêjim?

-Ji bo mirovan stêr giş ne wek hev in. Ji bo kesên ku koç dUdn, stêrUc rêber in. Ji bo hinin cHn, ew tenê rohnîyine biçûk in. Ji bo zaniyaran ew serêş û teşqe ne. Ji bo karferm^ min ew zêr bûn. Lê eger hemû stêrUc ji bo her kesî bêdeng in, ew ê ji bo te ne wek ji bo tu kesî bin...

-Ez têngihêjim!

-Gava tu ê bi şevan li asaman binêrî, ez ê li ser yekê ji wan bim û ji ber ku ez ê bUcenim û wê ji bo te xuya bibe wek ku hemû stêr dUcenin. Ji bo te, erê ji bo te, stêr wê bizanibin bikenin!

Û ew dîsa keniya.

-Û gava wê di ber cULê te de hê dan (mirov herdem dUanî cHbe). Tu ê bi naskirina min kêfxweş bibî. Tu ê herdem hevalê min bî. Tu ê bixwazî bi min re bUcenî. Û carinan tu ê ji bo kêfê pencera xwe vekî...Û hevalên te wê li te bimînin ecêbmayî çima tu li asmana dinêrî û ji ber xwe ve dUcenî. Wê g3.vê tu 93

ê ji wan re bêjî: "Erê, stêrik herdem kenê min tînin!" Û ew ê bawer bUdn ku tu dîn bûyî. Wilo jî, fena min wê li te bûbe...

U ew dîsa keniya.

-Wilo jî min ê wek di şûna hemû stêrikan de qiyametek zengUên biçûk dabin te.

Û ew dîsa keniya. Pa^ wî xwe car din giran kir û got:

-Işev... ez naxwazim ku tu t)êyî.

-Ez ê dev ji te bemedim.

-Tu ê bawer bUd ku ez ê bêşim...Yê li min binere wê bawer bUce ku ez dimirim. Erê ew wilo ye... Neyê vê yekê nebîne, ne hewce ye...

-Ez ê dev ji te bemedim.

Lê ew xemjwar bû.

-Ez vê yekê...ji ber mar jî...ji te dixwazim. Nabe ku ew bi te vede...Mar pîs in. Ew dikarin ne ji bo tiştêkî, tenê ji bo kêfê biyeldvedin...

-Ez ê dev ji te bemedim.

Lê wek ku rişteki dilê wî bixista cîh, wî got:

-Min ji bîr kiribû ku mar nikarin du caran li dû hev bi mirovan vedin...

Wê şeva hanê min nedît çawa wî da ser rê. Ew bi dizîka bê

ku dengê xwe kiribûya çûbû. Gava paşê min xwe gUande wî,  
ew bi payine sivik û bi dUekî biiyardar dimeşiya. Wî tenê ji  
min re got:

-Ha! Tu li vir î...

Û wî bi destê min girt. Lê car din rişteki di nava wî de ew  
nerehet ldr û wî got:

-Tu şaş hûyî tu harî. Tu ê bêjî. Yê li min binerê wê bawer  
bilce ku ez çMirim lê ew yek ê ne rast be...

Min bi xwe dengê xwe nedildr.

-Tu têdigihêjî! Devera ku ez ê biçimê gelekî dûr e. Ez nikarim  
vî gewdê hanê bi xwe re bibim. Ew gelekî giran e.

94

Min bi xwe dengê xwe nedikin

-Lê ev gewdê hanê wê li şûna min wek qalikekî kevnî avêrî  
bimîne. Ma dilê mirovan ji ku bi qalikên kevin dijewite...!

Min bi xwe dengê xwe nedUdn

DUê wî hinekî sar bû. Lê wî dîsa zor li xwe kir û got:

-Tu dizanî ku ew ê tişteki xweş be. Ez ê jî ji xwe re H stêran  
binerim. Stêr hemû wê ji min le bibin bîrên bi çirUcên zingargirtî,  
hemû stêr wê ava wexarinê bidine min...

J'7

V 1

/

Min bi xwe dengê xwe nedUdn

-Ew ê çi xweş be! Wê pênc sed mUyon zengilên biçûk ên te  
hebin, wê pênc sed mUyon çavkariyên min hebin...

95

U wî nema dengê xwe kir ji ber ku ew digiriya...

-Ev der e. Bihêle ku ez gavekî bi tena xwe bavêjim.

Oew ji ber rirsa nava xwe rûnişt.

Wîdîsagot:

-Tu dizanî... giUa min... Ez bi xwe berpirsyarê wê me! Tu nizanî ew çi qels e! Ew çi lcawik e jî. Ew bawer dUce ku ew herçar stiriyên pîsUc ê ji her tişd biparêzin...

Ez rûniştim ji ber ku min nema dUcarîbû li ser darên nigan xwe bigirta Wî got:

-Va ye... Anuha tev bû...

Ew dîsa hinekî dudUê bû, paşê ew rabû ser xwe. Wî tenê gavek avêt. Min nikarîbû xwe buivanda.

Nêzîkî gûzeka wî wek birûskekê lêda. Ew kêlîkekê bêliv ma.

Wî nekir qîrîn. Ew hêdîka wek darekê hat xwarê. O ew hate xwarê lê ji ber xîzê tu deng ji ketina wî derneket.

XXVII

Û anuha, heibet, şeş sal di ser wê yekê re derbas bûne... Min hêna tucarî ev çîroka hanê ji tu kesî re negotiye. Hevkarên min geled kêficweş bûn gava çav li min kerin û dîtî ku ez hêna sax bûm. Ez dikemgîn bûm lê min ji wan re got: Ev ji ber westebûnê ye...

Anuha ez hineld dUdane bûme. Ez dixwazim bêjim... na bi rastî hêna kiUa dilê min dijwar e. Lê ez xweş dizanim ku ew vegeyriyaye ser gerestêra xwe, ji ber ku roja çHn, di destê sibehê de, min laşê wî li wê derê peyda neldr. Ew ne laşekî wiqasî giran bû...Û bi şevan ez hez dUdm H stêrikan gididarî bUdm.

96

Ew ji min re dibin wek pênc sed milyon zingilên biçûk...

Lê va ye tişteki gelekî seyr û dûrî aqilan. Devbenda ku min

ji bo mîrzayê biçûk çêldribû, min ji bîr kiribû ez jê re benUcên çermînî çêbUcim ta ku ew bikaribe wê xweş bixe devê berx. Wdo jî ez ji xwe dipirsim: "Gelo çi li ser gerestêra wî qewimî ye? Kî çHzane, belid berx gui xwaribe"...

Carinan ez ji xwe re dibêjim: "Bêguman na! Mîrzayê biçûk her şev giUa xwe dixê bin camê û baş hayê wî ji berx heye"...

Wê gavê ez xweşbext dibim û hemû stêr bi nermî dUcenin.

Carinan jî ez ji xwe re dibêjim: "Nabe ku mirov carekê ji caran xwe ji bîr neke û ew car bes e! Wî êvarekê cam ji bîr Iciriye an jî berx bêdeng di şevê de derketiye..." Wê gavê jî, hemû zengilk dibin hêsiri...

Sirra mezin di vê de ye. Hûn ên ku wek min ji mîrzayê biçûk hez dikin, hûn dizanin ku cîhan, geytî tucarî wek xwe namîne eger li derekê ku em nas nakin, ku berxekî ku em nas

97

nakin, erê an na, giUek xwarit)e...

Li asmanan binerin. Ji xwe bipirsin: Berx, erê an na gid xwariye? Ê hûn ê bibîn ku, li gor bersivê, tişt bi giştî tîn guhertin...

One yek jî ji nav mirovên mezin ê bUcaribe tebigihêje ku ev tişteld çi giring e!

^-^j vi

Ev dîmena hanê, ji bo min, dîmen cU dimyayê giştî de hew jê xweştir hene. Ew bi xwe eynî cUmena pelê pêşiya xwe ye, lê min ew dîsa çêkir ta ku ez ^\^ nîşanî we bidim. Li vê derê bi xwe, mîrzayê biçûk xuya bû û paşê, winda bû.

98

Bi balkêşî 11 vc dîmenê binerin ta ku hûn xwcş wê nas bikin, cgcr rojckê hûn di wê dcrê, di wê schra Afîqayc rc dcrbas bibin. Ê cgcr

rêya wc bi wê dcrc kct, cz ê ji wc tika bikim mdczînin, tcnê hinckî  
xwc 11 bln vc stcra hanê raglrln! Egcr lawUcck bl bcr wc vc bc, cgcr  
cw blkcnc, egcr porc wî zêrinî bc, cgcr cw bcrcsiva plrsên jê tcnê kirln  
ncdc, hûn ê wê gavê nas blkln ew kî yc. Ji kcrma xwe min wîqasî  
dilxcmgîn nchêlin: jl min rc zû blnlvîsln ku ew vcgcriyayc...

99

WEŞANÊN NÛDEME

BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ Celadet Bedir-Xan / Gramer

DÊ Û DÊMAf^ Egîdê Xudo / Roman

KESKESOR Nûredîn Zaza / qrok

DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat/Lêkolîn

HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Essay (Ceribandin)

MÎRZA MEHEME Medenî Ferho / Roman

MILKÊ EVÎNÊ Rojen Banas/Siîr

ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydogan / Çîrok

BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Hesên / Roman

MÎRZAYÊ BIÇÛK A. de Saint-Exupêri Werger: F. Husên / Çîrok

GOTIN YaşarKaya/ Essay (Ceribandin)

ANTOLOJIYA dROKA NÛ YA KURMANCÊN BASÛR Amadekar: X. Duhold

SEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî/Roman

MISK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî /Roman

BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger: Firat Cewerî/Piyas

LI BENDA GODOT Samuel Beckett Werger: Firat Cewerî/Piyas

GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Rrat Cewerî/Aforisma

GIRTÎ Fwat Cewerî/ Çîrok

KEVOKA SPÎ Rrat Cewerî/ Çîrok

Nivîskarê fransî Antoinc de Saint-Exupcry ev

pirtûka jêrîn Mîrzayc Biçûk ji bo biçûk û mezinan



nivîsandiye. Ew dixwaze bi destên mezinan bigire û wan bigihîne zarokan, wan vegeîne xweşî û dilpakiya zarokdyê. Hêviya nivîskar ew e ku ew mezinan, ango me, bispêre tixûbên jiyana rast û sade. Di vê pirtûkê de, her xwendevan, çi mezin çi biçûk dikare bi saya hevok û resiman li balafira xewnan siwar bibe û pêrgî Mîrzayekî biçûk were.

Ev pirtûka ku wergeriyaye piraniya zimanên cîhanê, hebûna wê ya bi kurdî xewneke xweş e.

Weşanxaneyê me bawer e ku bi çapkirina vê pirtûkê berpirsiyariyeke dîrokî bi cih aniye û zimanê kurdî kiriye şîrkê zimanên cîhanî.

\*\*

## MIŞKA PIŞIKÊ RA ÇAWA ŞER KIRIN

Werger: Casî mê Celîl

Wien - 2012

Çap kîr - Înstîtûta kurdzaniyê - Wien (IKW) Xinko Aper: Mişka pişikêra çawa şer kirin Werger - Casî mê Celîl

Lîtograf - Sêrop Gasparyan

Weşana pêşîn - 1935 Rewan

Karê kompyûtêrê - Lûsîka Gêrman Mîzanpaj - Cemal Celîl (Alionis)

ISBN 3 - 902185 - 31 - 7

(Çîrok)

(Bona neviyêd mine biçûk)

1

Tû binêre

Pişîka wa ...

ifet gilover

Çev hilû,

Simêl arşîn

Hilşyane ser sîng, Pelişî-pelişî velezayî, Zik dirêj sirsûmek,

N av jî Kostan. Me rokê Kostan,

Bire bostan

5

Mişkistan.

Min derê kîlerê vekir, Ew çû kîlerê bona nan,

Bi ser pîyava kete sebetê, Xwe ji sebetê, avîte pencerê. Virda-wêda kire mirtemirt, Kûnc, bûcax bîn kir.

Bîna Mişka kete poz,

Got pake-pake cem we, Mişk vira Mal malatin ... Mişk vira şokolatin ...

Ezê li vir hevtêkê bijîm,

6

Nêçîra mişka bikim zefû zef, Çiqas hindik dusid hev. Velezîya, zikê xwe miz da, Poça xwe ku erdê xist,

Deng gihîşte dinîya terî.

2

Ji bin erdê

Mişka ji tirsê bîn nekişandin

- Wey, dayê can, wey, gazî kirin, Wa jî hincirandin

Bav, dê, bira, xûşk,

Em mirin, inda bûn ...

7

Wajî xeta?

Diha kî bike galêt, gate, Qatix, dew, şîr,

Toraq, keşk,

Savar, den,

Wa bêvilxilînk.

3

Ku her tişt xwerin, kuta Bûne şkilêt, ta û têt, Berev bûn civata mişka, Û  
saz kirin ordîke mezin.

8

Hildan, xwakirin çek û sîleh, Rikêv kirin ser pişîkê.  
Mişkê Egît serkarê-mişka,  
Sond xwer wekî rake postê pişîkê. Xwe jî mezin,  
Danîn serê xwe kumê pola, Pey avît belebanekî boz,  
Pêşîya esker, def pêra,

9

Gim, gim, gim, iim ...  
Erd dike gime-gim, ax tu, ax tu"/  
Rave bireve qula derîra, Egît hat bi def, zumêva.

4

Esker ma ber dêrî, Mezinê mişka çû kîlerê

10

Gim, gim, gim, defçîya, Gim, gim, gim top,  
Top agir dîkin,  
Gulla dîwar, derî qul dîkin.  
Esker kete kîlerê jî  
Ne mewîne, ne jî miremir. Pişîk mirye, bûye dar,  
Û simêl ser sîng raxistîye.  
Esker top bû dora pişîkê,  
Bêvil pîvandî heta poçîkê. Hergê ewana başqe-başqe egîtin, Lê nêzîkî  
pişîkê navin,  
Mezine tirs, neku mirin.  
Zerzend gihîştê, simêl kişand, Lê pişîk jicî neleqya,

Banzda ser zik, da bi zorê, got, Guhdar bin, xeberdana Egît.

- Filan û tistan,

Hebû Kostanekî nes,

Hatibû bostan, mala rehetbûnê, Hilşand Mişkistan.

Zirardarek, diranê wê mezin,

12

Pişîka zef bêîsaf, Simêl bi xwe,

Xwe har bûyî.

Em hatin ji heqê wê, Hişk bû ji tirsê me. Sekinîme ser zik,

X wezil roj a îroyîn, Kêf bikin, mişkno, Ew yeke diz bû.

13

Û dest pêbû lîstin, lîstina, Esker lîstina mişka girt, Mişkin ser govendî,  
komekdar jî defçî.

Yek jî pişik taş-taşî,

Dest bi hev xistin, banzda, Zerzendê egît bin lepê xwe Di herîyêda inda  
kir.

Û ne nihêrî çiqasbûna wan, Bi şer alt kir wê ordîyê

14

Mezin, çûk,

Gişk bûn çûçik - mûçik Wa egît bû ew pişik, Hostayê qoçax û hişyar,  
Xapand, gişk nêçîr kir, Mişkê mezin û biçûk.

Lîstka pişikê bû, lê heqê we bû, Hûn zevzekno, talançîno,

Heywanêd bêaqil,

15

Bi şevî, talanê mezin. Yan birinc, yan savar.

Çê biqewime, talan bikin, Kinc û pirtî vî atî, wî alî,

Bi pîvin-bibirin kiras-derpê,  
Kum bidrûn, biqelêşin mêşoka, Belakin êmîş, têkevîne qutiyê, Findeq  
buxun,  
Neki mişkê pûçno. De, herin, ji vir wa, Çan-şayn-kaşî Serkarê mişka,  
Bi Zerzendra,  
Li wî walatî,  
zik bigerînin,  
Qirêj û zeng,  
êşê belakin.  
Ji vir wa,  
De herin  
Jîr û qoçax,  
bi mişktî,  
16

diza, çûçik. Girara bi tem, mişkê dizra,  
Çi ne çetine, ne layiqe.  
De herin,  
Bi sirê, sirê, Eylmxin derbê.  
Qat-qatî,  
Biçûn xirabkin, Kitêbê qaline biha. Ez şîn kim ser we, Mişkê nezan,  
Her tişt xamo.  
De, herin, bi mişkî, Mişk laqirdî, rihetîyê nedin,  
Yêk razane li odê Derî şêmîk, erd, Kirte-kirt kin  
bin diranê xwe.

17  
De herin, govendê bigrin, Û bilîzin  
çilî-vilî, gilî-milî, Xwe veşêrî.  
- Bigrin berstuyê,

- Çêj ik têkevinê,  
Paşla dê, Bidin wana, Hemêz bikin Bi mişke tirs, Bi teqe-teq, Ji ÇI revî.  
Ax hûn çiqas zirardarin,  
Ji qebîla wera, tele, pişîk,  
Û ew biwa şîretkarî, Seydayê mezin, hosta Kostan,  
Ku bê bostan,  
Bê û bike, we Postanî.  
Yanê na dinîya  
hûnê lêyîkin,  
Zifa nifirçîne,  
18  
qebîleke xirav,  
Û dîsa zef-zef  
bê rune .  
Ji wê rindtir  
roja xweş nebînin.

19

\*\*

Sîras

## MOA Û PELLE

Çîrokeke Evînî

Kerstîn Johansson iBacke

Moa û Pelle

Çîrokeke evînî

Kerstin Johansson i Backe

Wêne: Inger Edfeldt

Wergera ji swêdî: Serkan Birûsk

NÛDEM

Weşanên Nûdemê: 53

Moa û Pelle

Çapa yekem: Stockholm: 2000

© Kurdiya wê: Weşanên Nûdemê

Pergala bergê û rûpelan: Nûdem

Wêneya bergê: Inger Edfeldt

Wergera ji swêdî: Serkan Birûsk

Navê orjînal: Moa och Pelle

Çap: Nina Tryckeri

ISBN: 91 88592-53 7

Navnîşan: Nûdem: Box 177, 177 23 Jarralla

E-mail: nudem@telia.com

Tel û faks: 08-58013162 / 08-58356468

Hîna ji hatina otobusa dibistanê re wext mabû.

Dîsa jî, Moa û Pelle rûniştin û li bende

man. Wan dixwestin êmin bibin ku otobus bê

wan neçûye. Bi rastî jî, ji bo wan rojek girîng bû.

Rojek ku ew ê tucarî jibîra nekin û ê timî di bîra

wan de bimîne.

Ew li ser vê rojê fikirîbûn û peyivîbûn. Ew roja

ku ew ê dest bi dibistana bi rastî bikin. Carnan

wan bêrî dikirin. Carnan jî, ew ditirsiyan.

Dema ku Pelle li gotinên bavê xwe guhdarî nedikir,

bavê wî digot: "Tu bisekine heta tu dest bi

dibistanê bikî! Li wir tu ê baş fêr bibî!" Û Moa,

ew li hemû zarokan difikirî. Ew ya ku wisa şermok

bû. Lê Pelle bi wê re bû. Vê rewşê hesteke

xweş û ewle dida wê. Ew roja ku wan ê bi hevdû

re pifî çardeh findên li ser pasteyê bikira, hate bîra Pelle. Ew çiqasî kenîya bûn. Pişt re ew bi hev re ketibûn binê nêrdewanan û li ser mezinbûna xwe peyivîbûn.

Bi rastî jî tijekirina heftsaliyê gelekî girîng bû. Mirov şeş salên xwe tije dike û dibe heft salî. Wek ku tu qevzekê bi jor de hilkişî. U pêpelokek din jî. Du çiftlik li teniştta hev li Lîllonê hebûn. Li yekê malbata Moa dima û li ya din jî, Pella tevî dayik û bavê xwe lê diman. Ev herdû zarok timî bi hevdû re bûn. Ew bi hevdû re li ser heman girikê qumê rûdiştin û bi hevdû re jî qum dikolan. Bi hevdû re dipijandin û dixwarin û radizan. Bi roj ew kêlîkekê jî, ji hevdû nediqetiyan.

Moa gelekî hej ji xewa serê sibehan dikir. Ew timî di xewê de dima. Pelle sibehan zû ji xew radibû. Ji roja ku dihate bîra wan, Pelle timî diçû ber mala Moa û li benda wê dima heta ku ew şiyar dibû. Ew diçû wî serî û dihate vî serî, diçû wî serî û dihate vî serî. Dayika Moa, ku navê wê Birgit bû, pencere vedikir û dixwest, ku Pelle were hundir, lê wî nedixwest. Heta ku Moa diçû û xwe di pencereyê re bi rûyê xwe yê sor û çavlixew nîşan dida. Wê kincên xwe li xwe dikirin, taştêya xwe dixwar û hêdî hêdî derdiket devê derî bi awayekî şiyar.

Roja wan ha wisa dest pê dikir.

Dayikên Pelle û Moa diviyabû di vê roja pêşî ya



dibistanê de li vir li qiraxa rê bûna û di ber zarokên xwe re heta dibistanê çûbûna, lê tiştin qewimîbûn. Dayika Moa berî bi hefteyekê piyê xwe şikenandibû. Ew niha li ser kursiyeye medbexê rûniştibû û çîmê wê yê celskirî radayîbû. Mirov nikarîbû bi vî çîmê han xwe bigihanda gundê Storbynê. Lê dayika Pelle gotibû: " Ez ê bi zarokan re herim, tu xeman mexwe!". Lê bifikire bê çiqasî nexweş e. Rojek berî ku dibistan dest pê bike, yek ji çêlekan çûbû nexweş ketibû û li tewleyê li erdê dirêj mabû. Diviyabû dayika Pelle li malê li bende Beytar mabûya, ji ber ku bavê Pelle diviyabû çûbûya êzingan. Herdû zarok ji ber ku dayikên wan dê li gel wan neçûbûna dibistanê aciz nebûbûn. Hema bêje bi dilê Pelle bû. Dayika wî gelekî baldikişand ser xwe. Ew bi dengê bilind dipeyivî û dikeniya. Li malê ne xem bû. Heta hinekî xweş jî bû. Lê li bajêr. Pelle gelek dayikên din jî li bajarê Storbynê dîtibûn. Ew zêde wisa ecêb xuya nedikirin. Pelle zanîbû ku ev şerm e, lê dîsa jî, carnan ji ber dayika xwe fedî dikir. Diviyabû ev ne li vê daîreya xweş pêk hatibûya. Dayika wî wilo bi dengê bilind henek kiribû û keniyabû, ku hemû kesên li wir keniyabûn. Wek ku pîrekên din yê Storbynê naziktir bûn. Bi hemû aliyên xwe naziktir bûn, bi çavên xwe û bi dengên xwe. Pelle kincên nû kirîbûn. Kondê wî yê hişk hinekî

laşê wî dişidand, lê ew gelekî kêfxweş bû ku dayika wî ew kincên fireh û mezin ji wî re nekirîbûn.

Kond diviyabû teng bûya. Her çiqasî mirov li gundekî ku ji du malan pêk dihat dima jî, dîsa jî mirov zanîbû bê wê Kond çawa be. Kondê Moa jî hebû. Eynî mîna yê Pelle bû.

Moa ji zû de xwe fêrî xwendinê kiribû. Pelle difikirî, ka ew ê fêrbûna xwendinê zehmet be. Moa xwe qure dikir, ji ber ku wê, ji wan xêze-xemlên biçûk fêrî dikir. Moayê digot ku ev dê bibin çîrok. Lê Moa dê bi xwe bixwenda, ger li ber Pelle fêrbikirana, dê wî jî karîbûya bixwenda.

- Wek ku êdî payiz e, Moa gotibû.

- Çawa? Pelle pirsîbû. Ew difikirî ku havîn e.

Wê demê Moa ew kulîlkên li keviya kaşik nîşanî Pelle dabû. Çawa ku êdî ew blîlila klockorna nema blîlila bûn, kulîlk jî yeker çilmisî bûn.

Pelle fikirîbû: Çawa Moa dikare tiştên wisa bibîne, ji ber ku ew gelekî bîaqil e, ji ber vê jî gelekî kêfa min ji wê re tê. Dema ew carnan bi şev li wê difikirî, xwe hêdî dixist binê lihêfê, wê demê xwe bi xwe wêrîbû vê gotina rast bibêje: EVÎN. Ji ber ku ew gelekî şêrîn bû. Ê jî ber ku wê wisa xweşik IO

dinerî. Ji ber ku ew wisa bedew û narîn bû. Ê jî ber ku Moa wisa henûn bû.

Ew ê tu carî Pelle li xwe dananiya ku a dilê xwe ji wê re bigota. Wê ev zanîbû bê ku mirov peyvên

şaşomaşo jî kiribûya. Yê n mezin, bawer dîkin ku divê mirov di ser çardehan re be heta ku mirov karibe evîndar bibe. Lê Moa û Pelle herdûyan jî çêtir zanîbûn.

Niha otobusa dibistanê hatibû. Ew kesk bû û ew nêzîk bûbû û hey nêzûk bûbû û zarokan lewhe dîtibûn. Dawiya dawî ev roj hatibû, Pelle fikiribû. Niha êdî mirov nema zarok e. Niha em diçin vê dibistana rastî. Wî bi destê Moa girtibû û ew li qiraxa rê şipê rawestiyabûn.

Pelle gelek carên din şofêr dîtibû. Ew hema hema difikirî ku ew wî nas dike. Navê wî Axel bû û ew apekî gelekî devliken bû. Mirovekî wisa bû ku timî henek dikirin. Axel hemû gundiyên li vê herêmê baş nas dikirin, û ew bû yê ku hemû lazimiyên malbatên ku li dûrî Storbynê diman pêk diiii anî. Derman ji gundiyan ji dermanxaneyê dikirî. Ji dikanan jî lazimiyên gundiyan yê wekî din tedarik dikir.

Di dema ku Moa û Pelle bi otobusê ve hildikişiyan Axel bi wan re bişirîbû. Ew li zarokên din zîvirîbû û gotibû:

- Hûn dibînin ciwanino, ev beşek e ku zû dest pê dike. Van herdûyan, ji zû ve ye ku hertişt bi hevdû re eyar kirine.

Hemû zarokên di otobosa dibistanê de keniyabûn. Pelle û Moa tenê devên mezin yê dikeniyan dîtibûn.

- Hay ji xwe hebe, Pelle! qîriyabûn hinekên ku devên wan ji kenan heta bi pişta guhên wan çûbûn. Pelle destê Moa bi xar berdabû. Zaroktî ye ku mirov wiha bike, bi acizbûn fikirî. Ma mirov wiha bike, ji bo ku zarokên din bi mirov bikenin.

Ji bo Moa ev roja pêşî ya li dibistanê wek ku ew di nava teqana herî de bimeşe bû. Herîyeke wisa

12

ku mirovan hilnagire. Lê dîsa jî, hinek tûmikên hişk ku mirov xwe karîbû li ser wan girtibûya hebûn û dûv re yeka din dihat. Moa timî xwe wisa hîs kiribû.

Tûmika pêşî ya ku ewle xuya dikir, ew dem bû ku mamosta bi navê Sonja Persson ji baxçeyê dibistanê hatibû û bi destê wê girtibû û gotibû;

- Ez dizanim navê te Moa ye û tu ji gundê Lillînê hatiyî. Ger tu dixwazî tu dikarî digel min werî hundirû.

Ew ê pir baştir ba ku Sonjayê Pelle jî, digel wan baniya, Moa fikirîbû. Lê ew ji zû de bû ku ew bazdabû cem çend kurikên din.

Ew dema ku mamosteya wê hatibû derve û bi destê wê girtibû û jê re gotibû ku ew dikare bi wê re were hundir, wê axa di binê nigên xwe de hişktir hîskiribû.

- Diya te telefon da, bi mamosteyê re peyivî. Ew dixwaze ez binerim bê tu baş î.

Bi Moayê mamosteya wê ji hemû jinên ku wê

13

heta ditibûn xweşiktir bû. Bihara derbasbûyî hate bîra wê. Disa eynî mamoste bû. Niha mamosteya wê eynî mîna wê demê rind bû. Lê niha kincên wê ne şîn bûn, li şûna wê niha kesk in. Û niha gerdeneke pir xweşik di stûyê wê de bû. Gerdena wê ji mirariyên şînekeskên biroqanî yê avzêrîn hatibû çêkirin. Ew mîna roja li ber ava xuya dikir. Dibistan kevn, bilind û mezin bû. Lê tevî ku ew kevn jî bû, bêhna reng û boyaxa nû jê difûriya. Li wir bêhna zemqê ya sotaktiga hatibû.

Saeta pêşî hemû zarokan behsa xwe kiribûn, navê xwe gotibûn. Navên wan yê pir xweş hebûn.

Navên wan Kristina, Magnus, Susanna û Camilla bûn. Lê Moa tenê navê wê Moa bû.

- Moa Karlsson, wê got.
- Dengê xwe bilind bike, mamoste got.
- Moa Karlsson, Moa bi dengekî nizmtir got.
- Wa, mamostê got. Moa Karlsson.

Herkes li xwe zîvirîbû û temaşe kiribûn. Lê dema ku dor hate Pelle, wê demê wî navê xwe ne-

14

got.

- Par, wî got . Paar Andre.

Ecêb zêde dayik li wir hebûn. Lê ew nerûniştî bûn. Ew li ber dîwêr şîpiya bûn. Tenê du bav li wir hebûn. Mezin giş dikeniyên. Mîna ku ew li tiştine gelekî bi kêf temaşe dikin, xuya dikirin.

Wek ku hemû şagirt çêlîkên pisîkan bin. Wan mamoste mîna şivanekî ku şivantiya van çêlîkê pisîkan dike didîtin.

Li vir hundirê sefê bi rastî jî wisa talûke xuya nake, fikirî Moa. Li ser vê texteya reşşîn mamosteyê bi tîpên xwar yên mezin HUN BI XÊR BÊN nivîsîbû û dora nivîsa xwe jî, bi gulên xweşik î biçûk xemilandibû.

Vir jî mîna tûmikekî biçûk xuya dikir, piatformeke biçûk, li wir mirov ji strangotinê neditirsiya.

Derve, baxçeyê dibistanê bû ku mirov ditirsand.

Hîna jî ser dilê Moayê dişewitî. Ew kenê li otobusê wek ku dilê wê gezkiribû û pê ve asê mabû. Dibe ku dê hemû demên li dibistanê wiha bin. Dê ne

15

mîna ku Moa fikirî bûya. Wê xeyal kiribû bê wê çi xweş be. Bêrîkirin û tirs herdu jî bi wê re hebûn.

Lê helî zêde bêrîkirin. Wê çawa bûya dema ku Moayê ji xwe re keçikek ku bi wê re bileyize dîtibûya. Tucarî hevaleke wê çênebûye. Keçikek eyn mîna wê bi xwe. Tenê hevalê wê Pelle bû. Timî fikirîbû ku ew ê wî ji xwe re bihêle. Dema ku ew mezinbûbûna ê ewê bi hev re bizewicîna û ê zarokên wan çêbûna û tiştên wisa. U wê wan zarokek çêkira û wan li hevdû kiribûn ku ew ê keç be.

Heta îro jî ev wisa bû.

Li malê ew li ser şermoktiya wê peyivîbûn. Bavo

gotibû, gelekî baş e, ku ew derketiye derve nava xelkê. Ev gelekî baş e, ku ew dê dest bi dibistanê bike, wî gotibû. Wê demê ê şermokiya wê here. Lê berevacî bû. Moa ev hîs dikir. Ev der gelekî xerabtir bû. Tenê rûyên nenas hebûn. Wê gelekî bêriya odeya xwe kiribû, bêriya quncika ku tê de dileyist jî kiribû. Wê bêriya malê û dayika xwe kiri-

16

bû. Wê bêriya rojên xwe yê normal kiribû, bêriya leyistina bi Pelle re jî kiribû, rûniştina li ser çokên bavo û bi dayika xwe re li medbexê bûyin. Zengilê dibistanê lêdabû. Dengê tûj. Hemû di derî re derketibûn. Mamoste û zarok û malbat. Lê Moa li ciyê xwe mabû. Wê li vê sefa mezin ya çargoşe ku lê mobilyayên normal tunebûn xwe bi ewle hîs kiribû.

^^assaft.--

17

Tenê bankên biçûk, kursî û pencereyên bilin û hey bilind hebûn. Lê di wê demê de mamoste bi paş de hatibû, derî nîvcî kiribû û gotibû:  
- Wî Moa, tu çima li vir wisa tenê rûniştîyî?  
Ma tu jî narî derve û hewayeke paqij nastîni?  
Ev mezin, timî behsa hewayê dikin, Moa fikirî.  
Dayika Moa û ya Pelle jî wisa dibêjin. Dema ew dixwazin tenê bimînin. Ji ber, ku ew ê li ser tiştên wisa bipeyivin, ku ew difikirin, zarok bila ji wan

fêm nekin. Ev mezin carnan dibin mîna zarokan.  
Ew difikirin, ku zarok tucarî tişteki fêm nakin.  
Çakêti li poxanê (korîdorê) daliqandî bû. Çakêtê  
wê bi tenê xuya dikir, dema ku ewqase çengelên  
vala hebin û tenê çakêtek daliqandî be. Heta ji  
Moa dihat bi giranî tevdigeriya. Lê mamosteya  
wê li bende bû û çavên xwe jî ji ser wê ranedikirin.  
Ji ber vê yekê jî, Moa tenê diviya bû, fermûara  
çakêtê xwe bikişanda jor û derketa nava zarokên  
li derve.

18

Hemû zarokan bi kêf xuya dikirin. Tenê yek jî,  
ji nava wan mîna wê wisa aciz xuya nedikir. Li  
her deverê rûyên nenas hebûn. Ji bilî yekî. Wê  
Pelle dîtibû. Lê dema ku wê xwe li Pelle girtibû û  
hetibû cem wî, wî bi acizî gotibû:

- Here ji cem min!

Moa gavekê bi paş de çûbû. Wê çend keçikên ji  
sefa xwe dîtibûn, û wan dîtibû bê Pelle çawa berdabû  
wê. Çavên hemûyan beloq bûbûn. Moayê  
nema zanîbû bê wê bi ku de here. Tenê rûyên nenas  
li dora wê hebûn. Rûyên biyanî. Zarok yê  
ku pir qenc û milahîm xuya dikirin, lê dîsa jî,  
Moa ji wan ditirsiya. Hinek ji wan mîna Moayê  
girs û xişin bûn, lê yê ji wê girstir jî hebûn. Yê  
ku diçûn sefa pêncan, û yê ku wextî şeş biqedandana.  
Û mamoste hebû li derve...

Moayê xwe ji zarokan dizîbû. Ew ji xwe re li cîhekî



ku lê zarok tunebû geriyabû. Carnan ew berepaş çûbû. Hêdî hêdî ew nêzîkî deriyê baxçê dibistanê bûbû. Wê nedixwest ew li devereke ku ew

19

nasnake bimîne. Wê baş nizanîbû bê ew ê bi ku de here û bide ser kîjan rê. Çiqasî ew li deriyê hewşê yê şîşkirî nêzîk bûbû, wê ewqasî lez kiribû. Dema wê derî li pişt xwe hiştibû, ew bi bazdan ji wir dûrketibû. Wê qet nizanîbû bê ew ê bi kîjan riyê de here.

Hemû zarok bi lez hetibûn sefê, di wê demê de Pelle ferq kiribû ku Mao reviyaye. Ew difikirî gelo ew bêje. Pelle yê ku difikirî, dê Moa pir hej ji dibistanê bike. Moa ya ku dikarîbû bixwenda û bi hertiştî zanîbû. Dîsa jî ew bû ya ku xwe xera kiribû.

Lê Mamosteyê jî ferq kiribû ku Mao ne li sefê ye.

- Moa li ku ye?

Ji bo ku ew dilê xwe têxe cî wê li kaxiza navan nerîbû.

- Ka Moa Karlsson li ku ye? mamosteyê gotibû.

Pelle sor bûbû. Eynen wek ku wî keçik jibîra kiribe.

20

- We tiştêkî xerab li himberî Moayê nekiriye ne, ku ew pê aciz bûbe, bi pirsyarî gotibû.

- Naaa, hemû zarokan gotibûn. Wan wê aciz nekiribûn. Wan keçik tenê carekê jî nedîtibûn.

Pelle, fikirîbû: dibe ku min tişteki xerab kiribe.

Piçek dînîti kiribe. Hate bîra wî dema ku wî bi acizî ji wê re gotibû:

"BIQEŞIDE". Lê wî ev negot.

Mamosteyê Pelle şandibû derve. Ew bû yê ku keçik nas dikir, ji ber vê jî, ew ê çûba li derûdorê li wê geriyaba. Dîsa jî, Pelle xwe suçdar didît. Ew bû yê ku bi wan keçikên din ku mîna dînan tevdigeriyan re peyivîbû. Pelle hîskiribû bê çawa hinarkên wî mîna agir sor û germ bûne.

Lê baxçeyê dibistanê vala bû. Wî Moaya çakêtsor û kondşîn nedîtibû. Li ser riya li pêşiya wî otomobîl derbas dibûn yek li pey yeka din. Wî xaltîk û metikên ku ji kirînê tevî tûrikên xwe yê tije dihatin dîtibû.

Wî baş fêhm kiribû ku Moa niha li ser rêya malê

21

ye. Ew baş têgeheştibû ku ew ê bi bazdanê nikaribe bigihêje Moayê.

Pelle bi qasî kêlîkekê li devê deriyê sefê rawestiyabû.

Wî dizanîbû ku ew dikare bi awayekî alîkariya Moayê bike, lê wî nizanîbû bê ew ê çawa bike.

Ew gelekî li ber Moayê diket. Bi wî re hîsa ku Moayê tenê û xemgîn daye ser wê riyê çêbûbû.

Pelle fêhm nekiribû bê çima ew li ser wê psîka li malê fikirîbû ku tenê navê wê Pisîk bû. Havîne dayê ew bi bêhnçikyayî anîbû. Ev pisîkek bajarî guneh e, gotibû dayê. Pelle ne li bende bû, ji ber

ku ev çêlîk bû. Çêlîkên pisîka bi mirovan re dileyizin  
û şêrîn in, lê eva han. Ev dişibe diya min ku  
bi pisîkek wiha hatibû. Pelle hîna jî nizanîbû ka  
ew hej ji vê dike, ji ber ku ev pisîk qet ne henûn e  
û ne jî bi mirovan re dileyize. Tenê dînîtiye. Hate  
bîra Pelle dema wî carekê xwestibû bi wê re bileyize,  
bê çi bûbû û çawa derbas bûbû. Wî ji piçûpariyên  
kaxizan gilokek çêkiribû û ew gindirandibû  
ber pozê wê. Pêşî wê xwe hêdîka qelizandibû  
22

mîna ku ew ê bileyize, tam di dema ku Pelle fikirîbû  
ku ew ê xwe çem bike ser giloka kaxizan, pisîkê  
pişta xwe dabû gilokê û xwe di pişta dolabê de  
melisandibû. Li wir xwe serzik dirêj kiribû û ricifîbû  
û bi nerînên tirsonek temaşe kiribû. Ji wir deranîna  
pisîkê hema bêje pir zehmet bûbû. Pisîk hîna  
jî, ji herkesî ditirsiya ji bilî dayê. Moa jî eynî  
mîna pisîkê bêhiş û berrî bû. Wî nizanîbû bê ew  
dê çawa bike, ji Moayê jî. Di heman demê de ew  
bêtir aciz bûbû. Bazdana ji dibistanê. Li hindurê  
dibistanê wî gotibû: - ew ne xuya ye.

Mamosteyê awirên bêbawarî dîtibûn. Wan qasî  
kêliyê li hevdû temaşe kiribûn. Lê mamosteyê  
bilez awirên xwe ji çavên wî deranîbûn û rabûbû  
ser xwe û bi xar ji sefê derketibû derve.

Gelo Moa bi kîjan riyê de çûbû. Niha hemû  
malbatên li dibistanê li ser vê meseleyê dipeyivîn.

- Reva ji dibistanê, divê mirov tucarî vê neke,

keça binavê Camilla bi dengekî bilind gotibû.  
Pelle fêm kiribû bê çiqasî tişteki ne xweş bû, tiş-

23

tê ku Moayê kiribû. Gerek ew bi dû Moayê de  
çûbûya. Miheqeq ew niha li ser riya malê ye. Pelle  
diviyabû ew dîtibûya û ew anîba. Pê re jî ew aciz  
û hey aciz bûbû. Ji Moayê. Ji xwe. Ji Camilla û ji  
hemû zarokên din ku wisa bi coş û heyecan digotin  
ku divê mirov tucarî ji dibistanê baznede, mîna  
Moayê.

- Ev ne hêsan e, ku mirov biçûk be, mezinên ku  
li ber dîwêr rêz bûbûn gotibûn.

Pelle di çav, dev û hinarkên wan yên nepixî de  
dertanî bê ew çiqasî kêfxweş û razîne ji zarokên  
xwe yên ku ew fedîkar dernanîne.

Ji nişkê de mamoste li deriyê sefê xuyakiribû,  
careke din. Li pişt wê zilamek sekinî bû. Wê gazî  
Pelle kiribû û careke din wî xwe tewanbar hiskiribû.

- Bi raya min dê baş be ku tu bi xidame re herî,  
mamosteyê gotibû. Tenê, tu Moayê nas dikî. Ew  
niha li ser rêya malê ye û dema ew xidame tenê  
bibîne ew dikare bitirse. Tenê diviyabû ew rabûya

24

ser xwe û bida dû wî kesê ku mamosteyê jê re gotibû  
xidame. Ew li Volvoya wî ya kesk siwar bûbû.

Pelle mîna ku aciz nebûbe hereket kiribû. Rêyek  
dirêj û rast li pêşiya Moayê bû. Ji zû de bû,  
ku wê dev ji bazdanê berdabû. Niha ew hêdî diçû.

Ew fikirîbû: ez ê tucarî nerim malê. Heta ku çavên Moayê dîtîbû tenê daristan û daristan bû. Dema ku wê bi çavên xwe li dûr dinerî, li jora çiyê rê mîna qaîşek zirav î biroqanî xuya dikir. Çam û ew rîşên rîha katan ku bi wan ve daleqiyayîbûn gewr bûbûn. Rîheke wisa pir xweşik bû, mirov dikarîbû xwe pê mîna pîrebokan bixemilanda. Pelle û wê bi wan rîşan simbêl ji xwe re çêdikirin. Ew bi wan simbêlan mîna kalan xuya dikirin. Sipîndarek û yeka din xuya kiribû. Sipîndar wisa xweşik û bi ronî xuya dikirin, li kêleka wan çamên tarî. U li erdê ew kevirên mozin xuya dikirin. Daristan wekî sêhrbûyî xuya dikir. Bifikire ku cin li wir hebin, wisa hizirî keçik. Ger cinek were wê. Mo

\*5

ayê baş zanîbû ku cin tunene. Tenê ew carinan bi şev difikirî, ku dikare cin hebin. Yan jî dema ku mirov pir di nava daristanê de here. Ha wê demê

26

mirov difikire ku cin hene. Hilmeke kin berda. Bêdengî û xewletî li her aliyên wê hebûn û tirsê dixwest wê zeft bike. Carinan ew difikirî: Bifikire ku ez niha pêrgî xezeleke mezin bêm. Qet ew li hirçê nedifikirî, ji ber ku mirov pirr kêr, li van deran rastî hirçan dihat. Lê pezkovîyek. U pezkovî mezin bûn. Dema otomobîl li cem Moayê sekinîbû, wê baznedabû.

Bi dilê wê jî bû, ku reva wê wiha biqediya.  
Dema deriyê erebeyê vebûbû, ew xweşik û bê  
mişkule li dawiya otomobîlê rûniştibû. Moayê dîtibû,  
ku Pelle di erebê de ye. Ew li pêşiyê rûniştîbû  
û rast li pêşiya xwe nerîbû. Moayê fêm kiribû,  
ku Pelle qeheriya. Tevahiya rojê ew wisa bû. Moa  
xwe bi xwe: Ji xwe Pelle ji zû de ye, nema guh dide  
min.

Wek ku hemû tiştên di nava sînga Moayê de mîna  
kevirên belek yên biçûk têne hêrandin bû. Wek  
ku ew Moaya ku kêfxweş û dikeniya şikestibe bû.  
Wek ku ew Moa ya ku hej ji Pelle dikir û ew timî  
27

li pişt axur radimûsa nemabe. Wek ku ew Moa  
ya ku bi Pelle yê ku xwe dikir qiralê Çînê çûbe.  
Yan jî Moa ya ku dest di destê Pelle de, ji bo ku  
zanibin bê avzê ji ku dizên li nava daristanê digeriya,  
êdî ew Moa ji zû de bû nemabû. Wê hîs  
dikir, bê ew kevirên hişk yên di nava wê de çawa  
hemû tiştên nerm û xweşik hûr dikirin. U ew diêşiya  
dema hundirê wê dihate hêrandin.

Dema hêsirên wê destpêkiribûn bi ser destê wê  
de bariya bûn, wê germahiya hêsirên xwe hîs kiribû.  
Lê ev ne rast bû, Moa fikirîbû. Hemû tiştên di  
nava wê de cemidî û hişk û eceb bûn, lê dîsa jî hêsir  
gerim bûn.

Tevî ku Pelle li xwe nezîvirîbû, dîsa jî zanîbû ku  
hêsirên wê dibarin.

- De îca negirî, wî gotibû. U wî ev bi qehr gotibû.  
Lê Moa nekarîbû pêşiya giriyê xwe girtibûya.  
Hêsir nuqutîbûn û hey nuqutîbûn.

Destmaleke şîn î çargoşe bi zîzikandin ketibû ser  
çokên Moayê. Wê li jor nerîbû. Wê di mirêka pêşî  
28

ya otomobîlê de çavên xidamî dîtibûn. Moayê  
xwe tazî hîs kiribû. Wê xwestibû ku hêsirên wê  
nema bibarin. Lê ev destmala mezin pir baş bû.  
Xidam destpêkiribû peyivîbû. Wî destpêkiribû  
behsa zarokên ku ji dibistanê direviyan kiribû.

- Tu divê nefikirî ku tu şagirta pêşî yî, ku ji dibistanê  
bazdaye, wî gotibû. U tu ne ya dawî yî jî.

Min gelek keçik û kurikên biçûk vegerandine. Tu  
dibînî ez ji zû de ye, fêr bûme. Destmala min  
amade ye. Baş e, ne? Ew yê ku difikire bazde divê  
pêşî ji xwe re destmaleke mezin peyda bike. Tu  
dibînî ne bê çiqasî rehet û nerm e, gotibû, di dema  
ku wê qermuçankên çavên xwe bi wê destmalê  
paqij dikirin.

Moa bêhemdî xwe bi xidamê dibistanê keniyabû.  
Peydakirina destmalekê. Tukes li vê yekê nafikire  
dema ku mirov li ser riya revê be.

Hêdî hêdî Moayê awirên wî di mirêka pêşî ya  
otomobîlê de dîtibû. Meraqek piçekî xweş, ji bo  
baş têbigehêje bê bi rastî Moa yeka çawa ye.

29

- Hinek hene tenê ji bo revê çêbûne, zilam gotibû.

Erê, dibe ku ez divê xwe bideme nasandin.

Navê min Börje ye. Lê herkes ji min re dibêjin

Bettet.

- Bettet? got Pelle û jibîra kiribû madê xwe tirs bike.

Xedame serê xwe hejandibû û bi lêva xwe ya xwar keniyabû.

- Wisa xuya ye, ku devê min hinekî xwar e, xidame gotibû. Xidame bikêf xuya kiribû.

Lê pê re jî xemgîniyekê xwe di çavên wî re dabûn der û Moayê ev dîtibû, di mirêka li pêş otomobîlê de.

- Keçika biçûk, wî destpêkiribû.

- Navê wê Moa ye, Pelle gotibû.

Xidame careke din, li Moayê meyizandibû û gotibû:

- Te bi xwe dikarîbû navê xwe hilda.

Moayê di çavên wî de gelek pirs dîtibûn. Moayê baş zanîbû ku ew divê vê bîstikê jibîra neke. De-  
30

ma ku ew mezin bibe, ew dikare carinan li ser vê reva xwe ya pêşî bifikire. Wê xidameyê lêvxwar bê bîra wê. Ew ê ku bi wê daketibû û xwedî çavên bi mitale bû.

Demekê xidame yan jî Börje yan jî Bettet, yan jî em niha çi navî li wî bikin, werhasil ew bêhis rûniştibû.

Lê careke din wî dest bi axaftinê kiribû.

Û Moayê fêm kiribû ku ew tenê ji bo wê dipeyive, tevî ku wî berê xwe dabû Pelle.



- Carekê min keçikek nas kiribû, wî gotibû.  
Imm, em bêjin hivdeh salî yan jî bîst û sê salî hebû.  
Ew rewokeke wisa bû ku nayê gotin.

- Ew nediçû dibistanê ne? Pelle gotibû.

- Na, ew nediçû dibistanê. Lê ew keçeke ecêb revok bû.

Xidame keçik got, Moa fikirî.

- Ew keçik pir ji xwe ditirsiya. Hema dema ku wê di xwe de derdixist ku ew ne amade ye, wê bazdida. Yan jî ku ew difikirî, hinek ji wê aciz in. U dîsa jî ew di nava wan yên ku hebûn de ya helî  
31

bi aqil û bedew bû. Ji bilî wê herkes wisa difikirî.  
Heta ku min bihîst jî, ew wisa bû.

- Te ew digirt û dianî dema ew direviya?

- Belê, gelek caran. Hûn fêhm dikin, gelekî dilê min bi ser wê keçikê ve bû, tevî ku ew yeka wisa revok jî bû.

Careka din jî Moayê çavên wî di mirêkê re dîtin.

Niha çavên wî wek ku tije ken bin xuya dikirin.

- Bi raya min Moa eynî ew keçik e, xidame gotibû.

Moayê hilmeke kûr di pozê xwe re kişandibû ku pozê wê zirav bûbû. Ev xidamê ha jî mina hemû mezinan e, keçik fikirîbû. Ew timî mirov aciz dikin.

- Tu dizanî Pelle bê min çikir ji wê keçika ku hema direviya, xidame berdewam kiribû. Ez bi wê re zewicîm.

- Niha wê dev ji revê berda ye, pirsî Pelle.

- Erê, got Bettet. Ez bawer dikim.

32

Heta demekê jî kesî tişteke negot.

- Hûn dizanin kengî wê dev ji revê berda, piştî demekê gotibû Bettet. Belê, dema ku wê destpêkiribû hej ji xwe kiribû. Dema ku wê xwe bikêr dîtibu.

Ji zû de bû ku Moa nema giriyabû û ev çêtir bû.

Dibistana sipî ya mezin ji zû de xuya kiribû. Dema ku Moa ji otomobîlê derdiket, wê ew destmala şîn ya şîl dirêjî Bettet kiribû.

Pelle û Moa dest di dest de neçûbûn hundirê sefê.

Moa hinekî li pêşî diçû û Pelle bi dû wê de bû.

Moayê xwe mîna heywanan hîs dikir. Mîna berxikeke biçûçik.

Mamoste ji Moayê ne aciz bû. Lê wê li ser Moayê gotibû û hey gotibû. Herçiqasî mamosteyê berê xwe dabû hemû zarokan û bi giştî axifbû jî, lê Moayê zanîbû ku ev tenê ji bo wê tene gotin û li ser wê ne.

- Hûn baş dizanin dema ku zarok direve ez çiqasî xemgîn dibim. Zarok hemû li xwe vegeriya-

33

bûn û bi baldarî li Moayê temaşe kiribûn.

- Trafîk gelekî talûke ye. Çênabe kesek derbasî wî aliyê baxçeyê dibistanê bibe. Bifikirin ku tişteke biqewime.... Tije erebeyên ku bi lez diajon e... Ku mirov haj ji xwe neke.

U wekî din jî mamosteyê behsa ku ew bibin hevalên hev yê baş kiribû.

Li vegera malê, di otobosa dibistanê de, Pelle li dawiyê rûniştibû. Moa, ew li pêşî rûniştibû û qoltixa kêleka wê vala bû.

Hîna li sifderê bêhn hatibû Pelle. Vanîlî û pasteşekir û xweşetam. Dayê bi patinê daketiye, ew fikirî.

Kêliyê wan bêhnên xweş ew dabûn fikirandin.

Dayika wî ji wan kesan bû ku ew bi peydakirina tiştên nû mirov şaş dikin û behetî dihêlin.

U ger ev bêhna pasteyê be, wê demê Moa û dayika wê ya bi navê Birgit li vir in. Ew niha naxwaze Moayê bibîne. Lê, pê re jî Pelle fikirîbû. Birgitê niha piyê xwe şikenandiye. Ew nikare wisa dût û dirêj here. Ev baş e!

34

Dayê bi xemilandina pasteyê daketiye. Wisa xuya dike ku ew ê pirr bedew bibe. Niha hemû çîlek û bilalûk û tûreşkên di nava ava cemedî ya qûşxaneyê de bûn. Ê ev bi rastî pir xweşbû. Ew sosa vanila ya bitam ku hîna niha dayê di nava wê qeymaxa spî ya nepişî de dakiribû.

- Berî herkesî ez ê jê bialêsim, Pelle got.

- Ew zarokên qerese yê mîna te ku diçin dibistana serete êdî nema qûşxanan dialêsin, dayê gotibû.

Lê Pelle dîtibû ku ew tenê henekan dike.

- Roja te çawa derbas bû? Behs bike!

Pelle li ser tiştên qewimîne fikirîbû. Ger ew bibêje:

"Ez îro bi Torbjörn re bûm", wê dayê hema  
pê re bibêje: "lê Moa, ew diviya bi te re bûya?"  
Û ger ew behs bike ku Moa ji dibistanê reviyaye,  
yan jî ku zarok di otobusê de bi wan keniyane,  
wê dayê roja wî biherimîne. Carinan, Pelle fikirî,  
carinan zehmet e ku ew dayê wek dayik bibîne.  
Paste hate qetkirin. Pasteyên dayê gelekî mezin  
35

:^:~;;t&S\*#@:£?~;: ::.'

-j.^:^^-

û nepişî û bedew bûn. Dema Birgîtê, dayika Moayê,  
pasteyek dipat, ew gelekî xweşiktir dibû. Wê  
li ser pasteyên xwe ji toyê xelekên xwar î biçûk û  
ji rêçalê jî, fitîlên rast û yên xelekî çêdikirin.  
U pasteyên dayê bi rastî jî gelekî xweş in. Wî diviyabû  
ev qebûl bikira.

- De, ka bêje niha! dayê got. Tu divê pirtûkên  
xwe yên nû şanî min bidî.  
Pelle hinekî din xwe aciz hîs kiribû.

36

"Bêje!" " Niha behs bike" Mirov nikare tiştekî  
tenê jî ji xwe re bihêle, ew fikirîbû. Qet ji dilê wî  
nedihat ku ew behsa roja xwe bike.  
Niha paste qediyabû. Ew gelekî bilind bû. Bi çîlek  
û qeymaxa xwe ya sipî wisa nepişî bû. Wan  
xelek û girikan mîna bircekê paste hildigirtin.

- Ez karim qetîtekê bigrim? Pelle got.  
- Ne niha, dayê got. Em ê niha vê bi xwe re bibin

û em ê herin cem mala Kalsson. Dayika Moayê  
nikare xwe bi wî nigê xwe bigihîne vir. Me li  
hevdû kiriye, ku em şevbuhurka xwe li wir bikin.  
- Ez nayê wir, Pelle got û li wê pasteyê temaşe  
kir.

- Gelo ez karim niha para xwe bigrim? wî got

- Hoho, bi dengê mîna yê werdekê dayê gotibû.

Tu ê bibînî. Ger tu bi me re neyî şevbuhurkê,  
tu ê pasteyê bi çavên serê xwe jî nebînî, wê berdewam  
kiribû.

- Waa, Pelle madedayî gotibû. Wê demê ez jî  
naxwazim. Wî hîs kiribû bê acizî û nexweşî çawa  
37

li nava wî belav bûbû. Çilika wî li ser pasteyê diçû.  
Xweska wî paste nedîtibûya. Lê niha. U çûyina  
cem mala Moa. Tucarî. Wî çenteyê xwe yê nû  
heliqandibû koşeyeke medbexê. Li wir li pişt balîfî  
psîk razay bû. Pisîk bi tirs xwe avêtibû erdê û  
mîna fîşekekê ketibû binê yanê û Pelle ew çavên  
pisîkê yê ji tirsan beloq bûbûn, dîtibû.

- Ev çima pisîka me wisa tirsonek e? Pelle pirsîbû.

- Li vê dunyayê pir rehet mirov dikare biêşe, dayê  
gotibû. Pelle fêhm nekiribû bê dayê dixwaze bêjeçî.  
Pisîk di binê çenteyê wî de nemabû û ew birîndar  
jî nebûbû. Pelle xwe bi hejandin û badan di  
deriyê medbexê re avêtibû derve. Wî baş zanîbû  
ku dayê seba vê hereketa wî mereq dike. Lê wê  
tiştê tenê jî ji Pelle nepirsîbû. Dayê ji tiştê aciz

bûye, ew fikirî. Wê zanîbû. Ya helî baş jî ev bû.  
Pir çêtir bû. Wê dizanîbû mirov çawa difikire.  
Ger mirov li ser şûmâtîyan jî bifikirîya. Hewce ne-  
3«

dikir mirov ji wê re hertişt gotiba. Wê di mirovan  
de derxist. Ew gelekî ji derewan aciz bû. Derew û  
nerastiya helî biçûk jî, ew gelekî aciz dikir û wê  
demê wê dengekî "çiiiçii" ji jêra gewriya xwe derdixist.  
Di gava pêşî ku Moayê avêtibû nava medbexê  
de wê têderxistibû ku dayê bi hertiştî zane. Mamosteyê  
telefon dabû û giliyê wê kiribû. Wê ev di  
awirên pêşî yên dayê de dîtibû. Dayê li wê nerîbû  
wek ku dayê dixwest dilê xwe têxe cî bê ka Moa  
Moa ye. Wek ku fêrbibe bê ka vê roja pêşî ya dibistanê  
ew guherandiye.

Moayê dît ku dayê hinekî bi tirs e, ku behsa şaşiyên  
wê bike. Wê negot: " Lê Moa, ji bo xatirê  
Xwedê ev çi qewimî?" yan jî "Çima tu ji dibistanê  
reviyayî?" yan jî " Tu dixwazî bêjî çi bi..." Wê  
tenê temaşe kiribû.

Dawiya dawî wê gotibû:

- Mamosteyê telefon da. Ez dizanim bê te çi kiriye.

39

Ev ne pirs bû. Moayê ev nebersivand. Hertişt  
wekî ku tu dizanî ye.

Moayê li wê devera ku dayika wê tevlî alçiyên  
xwe lê rûniştî bû temaşe kiribû. Moayê baş fêm  
kiribû ku wê dayika xwe aciz kiriye û ew divê ji

ber vê kirina xwe fedî bike. U dîsa jî Moa fikirî ku ew bibêje:" Min tiştekek nekiriye. Dê di demeke kin de baş bibe. Xwe aciz neke." Wê dixwest bigota, wê dixwest ew wê giranî û birîna di nava sînga xwe de hinekî sivik bike. Niha Moa gelekî xemgîn bû hem ji bo xwe û hem ji bo dayika xwe. Moayê baş zanîbû ku ji ber hinek sebebên dayê mîna wê bi tirs e. Ew ditirsiya ku wê Moa bikêrî dibistanê neyê. Ne bikêrî dibistanê û ne jî bikêrî tiştekekî din.

- Niha wê mêvan bîn, dayê got. Dê Pelle û dayika xwe werin. Em ê roja pêşî ya dibistanê pîroz bikin.

Moa fikirî bê çiqas rehet mirov dikare dîn bibe. Pîrozkirina roja pêşî ya dibistanê di rewşekê de 40

ku ew ji ber xwe şerm dike.

Moayê rahişte çenteyê xwe yê sor yê dibistanê û hêdîka berê xwe dabû odeya xwe. Wê dixwest ku dayê ji wê re gotiba: "Ka ez li pirtûkên te yê nû binerim." Lê wê tiştekek negotibû. Ew fikirî bû, bê çiqasî dayê şa bûbû dema ku wê cara pêşî ferq kiribû ku Moa dikare bixwîne. Moa dikare bixwîne.

Wê demê dayê fikirîbû ku Moa êdî dikare bikêrî dibistanê were. Mala wan wê demê li Storbynê bû, û tenê Moa pênc salî bû. Moayê li hemû lewheyên nerîbû û gotibû:" Dayê ev berber çi ye?" U wê wiha gotibû ku peyv bûbû beerber. Û

dayê gotibû: " Beerber ne tiştê e." Lê Moayê lewheyek destnîşan kiribû û gotibû:" Li vir dinivîsîne beerber."

Dayê ji wê re gotibû ku ev berbeer e, û behs kiribû bê ew çi karî dikin û dayê gellekî şa bûbû ku Moa dixwîne. Wê karîbû hemû lewheyên li ser firinê bixwîne û Domus û pispore-caman û tevî ku ev gotineke pirr dirêj jî bû Moayê ev xwendibû. Wê demê gelekî kêfa dayê hatibû û wê bawer kiribû ku ê Moa bikêrî dibistanê were, tevî ku ew fedîkoyî ye.

Moa nedixwest ku Pelle û dayika xwe werin vir. Wê nedixwest tevî vê şahiyê bibe. Wê çawa ev ji dayika xwe re bigota?

Tam dema ku Moayê fikir derî bi dû xwe de bigire, dayê gotibû:

- Çidibe Moa.

Moa li dayika xwe zivirîbû. Dayê wisa bêçare xuya fikir. Ew rûniştî bû û wê ew piyê xwe yê celskirî dirêjî ser kursiya pêşiya xwe kiribû. Ew darçengên (darên binçengan) ku dayê ji nexweşxaneyê deyn kiribûn, wisa ew sipartibûn maseyê.

Ji aliyekê, tenê Moa dixwest here ber dayê û bi wêrekî bêje:" Sibe ê baştir be. Ew ê hertişt baş û xweş bibe. Xwe aciz neke."

Hema pê re jî wê dixwest bêje: ez naxwezin bi we re bim. Ez naxwazim tevî şahiya we bibim. Ji ber ku ev ne ya wê bû. Moayê dixwest xwe veşê-



42

re. Wê nedixwest ku Pelle bê.

- Tu divê alîkariya min û raxistina maseyê bikî,  
dayê got.

"Naaa", wê dixwest bi qêrîn bigota. Lê li şûna  
vê wê got:- baş e, baş e.

Moayê derî hêdîka bi dû xwe de girtibû. Çenteyê  
dibistanê yê sor avêtibû ser wê çarşeva livînan  
ya zer. Ev a ku wê bi xwe hilbijartibû. Ew çûbû  
ber pencereyê û li derve meyizandibû. Wê demê  
wê Anna, dayika Pelle li jêra kaşik dîtibû. Û ew  
tenê dihat. Pelle ne bi wê re bû.

Diviyabû ez aciz bûma, lê ez şa me, Moa fikirî û  
wê bazda medbexê.

- Dayê, vaye dayika Pelle tê. Min ew li jêra kaşik  
dît. Lê Pelle ne bi wê re ye.

U ji nişkê de wê bi kêfxweşî alîkariya dayika  
xwe kiribû. Ew dê ji xwe re li hêwanê rûnin, wê  
biryar dabû.

- Hihiii, dayê gotibû û hinekî ecêbmayî mabû.

- Û em ê wan fincanên xwe yê xweşik bînin,

43

Moayê dewam kiribû. Ew yê ku di qubaleyê de  
ne. Ew yê ku gulgulî ne.

- Birastî, dayê got.

Moa bi xar çû û ew firax anîbûn. Wê hema bêje  
xwêdan dabû. Wê mase pir xemilandibû û neqîşandibû.

Destmalkên zirav yê kaxetî. Selika nê.

Mûmdankên zîvîn.

- Ev divê mirov ji sersalê re bihêle, dayê got. Lê Moayê dixwest ku ew vê niha dayne. Dayika Pelle, Anna, wê find di nîvê havînê de pêxistibû.

- Erêêê erê, dayê got û ew serbest hiştibû.

- Ez tenê tîm, Anneyê got, dema di derî re dikete hundir.

- Lê ne destvala, dayê got û ew pasteya wisa xweş î mezin nîşan da. U ew gelekî kêfxweş bûn. Ew ê gelekî xweş bibe, Moa fikirî. Ê hinekî jî dê cûda be. Ev gelekî ecêb bû ku Pelle ne bi wan re bû.

- Mêran dev ji me berdan, dayika Pelle got. Niha em keç em ê wextekî xweş bi hevdû re derbas

44

bikin, û dest bi çîrokan kiribû. Çîrokên li ser wê bi xwe. Wê ewqas xweş digot ku Moa û dayika xwe ji kenan zikopiştî dibûn. Wek ku wê carekê deriyê otêlê li ber xwe girtibû, yan jî wek wê dema ku wê nikarîbû ew qoltixa ku wê bi xwe xistibû hundirê hesensorê deraniya derve. Yan jî wek wê cara ku wê mifta qubaleya kirêkirinê ya li navenda Stockholmê winda kiribû, û ciyê qubaleyê jî jibîra kiribû, bi wî awayî ew heta Romayê bê baxac çûbû. Gelek serboriyên dayika Pelle hebûn. Ew li gelek deveran mabû û ew tucarî tucarî netirsiyabû, Moa fikirîbû.

Ez dixwazim bibim mîna dayika Pelle, ew fikirîbû.

Ku ew bicesaret e.

Hîna jî tukesî di sefê de nizanîbû ku Moa dikare bixwîne. Zarokên dibistanê ev nizanîbûn û mamoste jî nizanîbû. Dema Moa di sefê de rûniştîbû û zarokên din dikirin qerebalix, carnan diheliqî serê Moa ku ew destê xwe rake û perçeyek ji pirtûkê bixwîne. Wê hemû şaş bibin û wê mamoste

45

bêje; "Moa, tu dikarî bixwînî? Me ev nizanîbû."

Di dilê Moa de hebû ku jîrekiya xwe nîşan bide, lê di eynî demê de jî wê dixwest xwe veşêre û xuya neke.

Li malê dayê ji wê pirsîbû dibistan çawa derbas bûye, û wê demê Moayê gotibû: "Baş". Moayê bi xwe jî nizanîbû ka wê gevezetî kiriye yan jî rastî gotiye. Dibistan ne wisa nexweş bû mîna wê roja pêşî. Wê destpêkiribû hevalên xwe yên sefê naskiribû.

U ew çawa bûn. Tukesî elaqê xwe ji wê nedianî.

Tenê carnan henekê xwe bi wê dikirin.

Yek ji kurikan navê wî Nicklas bû. Ew yekî wisa şûm bû ku timî şûmîtî dikirin. Zarokên din jî timî paşgotinaya wî dikirin. Ew bû yê ku bi pênûsa alkolê li ser maseya dibistanê nivîsandibû ku nivîs jê neçûbû. Dîsa ew bû yê ku hemû çakêt avêtibûn nava poxanê, ku hemû zarokên dibistanê li ser serê mamoste civiyabûn û qîrîyabûn:

- Dîsa Nicklas dîn bûye.

Û tevî ku mamoste bi Nicklas de xeyidîbû jî, ça-

46

vên wê keniyabûn. Çavin bi kêf û bêşerm li ser Nicklas bûn.

Hemû zarok, ji bilî Moa, xwedî heval bûn. Ew ji xwe re bi nêrdewankan ve hildikişyan. Bi topê dileyistin. Bi şerîtê dileyistin. Moayê pir dixwest ew bi wan re bileyize.

Ajotina pisîklet li baxçeyê dibistanê qedexe bû. Yê ku tenê ev dikir, Nicklas bû. Wê pisîklet bi ser keçikên ku xwe di ser şerîtê re diavêtin diajot. Wan dikirin qerebalix û dikenyan û bazdidan. Lê niha ew mecbûr bû ku dev ji ajotinê berde, ji ber ku xidame dihat. Ew yê ku navê wî Bettet bû, lê Börje jî dihate gotin ji wî re. Wexta Moa roja pêşî ji dibistanê reviyabû, wî Moa girtibû û anîbû dibistanê. Moa piştî wê rojê qet bi wî re nepeyivîbû. U careke din jî hewce nekiribû ku ew jî here derve û li Moayê bigere.

- Tu nikarî min bigrî, tu nikarî min bigrî, Camilla qîriyabû û di ber Nicklasê ku berdabû pey wê re bazdabû.

47

Niha leyistika maçîkirinê ê dest pê bike, Moa fikirî bû. Birastî jî wisa bûbû. Hemû kurikên din jî bi bazdan hatibûn û nêçîrê dest pê kiribû. Moayê zanîbû ku keçik jî hej ji leyistika maçîkirinê dikin. Tevî ku wan digot:

- Wîîî, ev kurik çiqasî dînik in, lê di çavên wan

48

de jî dilxweşî xuya dikir.

Leyistika maçikirinê, ew bû ku dema kurikan berdida pey keçikekê û ew inaçî dikirin. Bi taybetî kurikan dixwestin Camillayê maçî bikin. Tim û dayîm birek kurik li dora wê bûn.

Tukesî guh nedida Moayê. Pelle jî bi yêna ku bi leyistika maçîkirinê dileyistin re bû. Ew jî bi dû Camillayê de bazdida. Dema ku Moayê didît ku Pelle jî di nava birrê de ye ew gelekî diêşiya.

Navberdayinên dibistanê talûkane hîn jî, Moa difikirî. Ew timî bi tena serê xwe dima. Pelle timî bi Tornbjörn re bû. Ew yê ku gotina wî helî zêde li sefê derbas dibû. Ew serok bû. Ew Tornbjörn bû yê ku dikaribû di navberan de caman veke û kaxizan belav bike û texteyê paqij bike (jêbibê). Camilla jî serok bû. Tornbjörn û Camilla bûn yêna helî girîng, piştî mamoste û xidame, Moa fikirî. Û Pelle hevaltî bi Tornbjörn re dikir. Lê niha wî berdida pey Camilla di leyistika ramûsanê de. Moa li baxçeyê dibistanê tenê mabû. Nicklas

49

hetibû ber wê û bi çavên xwe yêna bêşerm li wê nerîbû û gotibû: "Tu hej ji Pelle dikî". Nicklas kurikekî wisa bû ku bêhna tiştên veşertî dikir. Wî ferq kiribû bê Moayê çawa li Pelle temaşe kiribû. Lê gelekî kêfa Moayê hatibû ku wî bi hertiştî nizanîbû. Ew roja havînê hate bîra wê, dema ku mezinan

şahiyeke mazin li dar xistibûn. Herkes li derve li hewşê bûn û dans kiribûn. Wê û Pelle jî xwe xistibûn binê wê maseya mezin ya li salonê. Pêşî wan jî xwe re behsa tiştên ku ew ê di mezinahiya xwe de bikin, kiribûn. Ew ê li ku bimînîn û ew ê çî karî bikin. Ew ê herdû jî bûbûna pîlot. Carinan ê Pelle îdare bikira û carinan jî dê Moayê birêve bibira. Û herdû ê eynî mîna hevdû bifikiriyana.

Tam di wê demê de Pelle qamûşê xwe nîşanî wê dabû. Lê wê demê Moa keniyabû û gotibû, ku wê hîna di dema ku ew du salî yan jî yek salî bû de dîtîye. Û herdû ewqasî keniyabûn ku qirika wan hilatîbû.

50

Ha berê wisa bû. Berî ku dibistan dest pê bike. Wêdema ku hîna Pelle hej wê fikir. Wan li medbexa dibistanê meqerna û avdohk xwaribûn û ew niha li ber devê deriyê sefê rêz bûbûn. Mamoste hatibû û derî vekiribû. Wê kêlîkê mamosteyeka din hatibû û peyivîbû.

- Herin hundir û xweşik rûnin, mamosteyê gotibû. Ez niha tîm.

Wê derî vekir û zarok ketin sefê. Moa jî nişkê de sakinîbû.

Li ser wê texteya reş î şîn bi herfên xwar wiha hatibû nivîsandin: MOA HEJ JI PELLE DIKE.

Moayê nizanîbû ew bi ku de here. Camilla dest pê kiribû qîriyabû.

- Mmmmooa hejjj jiii Peeellee diiike,  
Mmmaa heej jiii Pelle dikeeee, Moa hej ji Pelle  
dike.

- Moa hej ji Pelle dike, Moa hej ji Pelle dike, zarokên  
din jî dest pê kirin qîriyan. Pê re mamoste  
hatibû hindur. Mamoste hêrs bûbû. Pişt re ji wan  
pirsibû.

- Ev kî ketiye sefê tevî ku derî kilîtkirî bû? U kê  
ev tişt nivîsiye? Û çima...?  
Camilla çûbû ber wê texteya mezin ya şîn û hemû  
nivîs jêbiribû, û zarok keniyabûn:

- Nicklas e. Nicklas e.  
Camillayêbi dengê xwe yê bilind gotibû .

5\*

- Birastî jî wî ev nivîsandiye. Herkes dizane.  
Mamoste bi wê de jî xeyidîbû.  
Di dema bêhnberdanê de wan ew gelekî aciz kiribûn.

Nicklas û Camilla û Bengt û Ronny û hema  
hemû li Moayê hatibûn hev. Ew ketibûn pêşiya  
wê û bi yek dengî wan gotibû:

Kesek nikare ji vir derbas bibe, derbas bibe  
Heta ew navê hezkiriyê xwe nebêje.

NAVÊ WÎ ÇI YE? PELLE!

hemû bi hev re qîrîya bûn.

Car bi car. Car bi car.

Moa di nava zarokan de mabû. Ew nikarîbû ji  
wir derketa. Wê dizanîbû ku Pelle û çend kurikên  
din li nêzîkî wan bi topê dileyizin. Ew hemû gotinan

dibihîze. Moayê hîs kir ku hêsirên wê diherikin.  
Ev neheqî ye. Moayê tutîstek jî nekiriye. Û  
dîsa jî ew xerabiyên bi wê dikin. Çima wan Pelle  
aciz nedikirin?

Moayê tişteke ferq kiribû. Kurik gelekî qure dibin  
û di ber xwe re diçin dema, ew dibihîzin ku  
53

keçik hej wan dikin. Moayê tişteke din jî ferq kiribû.  
Wê nizanîbû bê ew ê çawa vê yekê zanibe, lê  
wê fêhm kiribû ku Camilla jî evîndarê Pelle ye. Ji  
ber vê ye ku niha Camilla sekiniye û serkêşiya zarokan  
dike ku ew Moayê aciz bikin.

Kesek nikare ji vir derbas bibe, derbas bibe  
heta ew navê heskiriye xwe nebêje.

NAVÊ WÎ ÇI YE? NAVÊ WÎ ÇI YE? NAVÊ WÎ ÇI YE?

Moa giriyabû, ji ber ku ew neheqî bû. Û ew giriyabû,  
ji ber ku kesekî bi wê re hevaltî nekiribû. Û  
ji ber ku Pelle dev ji wê ber dabû. Ji bo ku wî dihişt  
ku zarok wê biqehêrin. Moa fikirîbû: Ku  
niha birrek zarok li ser serê Pelle civiyabûna û ew  
wisa aciz bikirana û wê ev dîtibûya. Wê demê ew  
ê çûbûya cam wan û ji wan re bigota:

- Ev çima hûn wilo dîn in.

Dikarîbû ew ji wê jî aciz bûbûna. Lê Moayê baş  
zanîbû ku wê dê wiha bikira. Hevaltî ev e.

Ecêb bû dema wan didît ku keçik digirî. Niha

54

helî zêde ew ji bo girî digirî. Di wê demê de xidame



hat. Ew ê ku navê wî Börje bû û bi navê Bettet jî dihate nas kirin. Ew rast hatibû ketibû nava koma zarokan û bi ser wan de qîriyabû:

- Îca ev çi ye? Zarokno, qey we aqilê xwe xwariye! Wî xwe bi ser Moayê de daqul kiribû û hêdîka gotibû:

- Rojbaş, hevala biçûk. Ha ji te re tu dikarî destmalkê careke din deyn bikî.

Destmalk çargoşe î şîn bû û Moayê meraq kir, ev eynî destmala berê bû.

Dûv re wî berê xwe da zarokan ku strana-acizkirinê digotin û ji wan pirsî ka çima ew li hemberî wê wisa nebaş in. Lê hemû zarokan gotibûn:

- Em tenê henekan dikin. Ev tenê henek bûn.

Lê Bettet aciz bûbû.

- Henek, çi henek û çi hal. Ji xwe re li keçikê binerin. Ev ne tu henek in ku hûn wê bi girî vedikin.

55

Û wî bi destê wê girt û ew bi xwe re daxiste odeya xwe ya nêzîkî qeboyê. Ew odeya ku bêhna boyax û terepentînê jê dihat. Aletên tamîrê bi hemû dîwaran ve daliqandîbûn û mase hemû reş bûn û ser wan tije lekeyên neftê bûn. Moayê dema xwe ya mayî hemû li wir derbas kiribû.

Pelle mîna hertimî li dawîya otobosa dibistanê rûniştibû. Ew ê piştî kêliyê bigihin Lillona ku li wir Moa û ew ê peya bibin. Ew kêlîka helî bi acizî ya seranserê rojê bû.

Pelle ji binê fê m nedikir çima wiha bû. Wî hewl da ku ew li ser tiştên ku îro li dibistanê qewimîne bifikire, lê wî di xwe re nedîtibû. Wî xwe bi xwe digot ku min zarok li wê sor nekirine. U wî tucarî bi zarokên ku Moa aciz dikirin re hevaltî nekiriye. Wî ji cîyê xwe aliyekî ji kumê sor yê Moayê dîtibu. limi ciye h keleka we vala bu.

Ew ê piştî kêliyekê bigihin cîyê peyabûnê. Ew dema ku Pelle helî zûde jê ditirsiya. Ew ê bi dû 56

hevdû bédeng de herin. Ew ê yek ji wan tenê gotinekê jî neke û wek ku di navbera wan de çaleke mezin hebe. Carina Pelle difikirî ku ew ji otobosê peya nebe û ew here heta cîyê ku Svenne û Gert lê dimînin. Ew ê ji wir hêdî hêdî ji xwe re ber bi malê de bimeşe, tenê ji bo ku ew ji çûyina bédeng ya di pey Moayê de rizgar bibe.

Ger ez ji wê re bibêjim:" Em li hevdû bîn." Lê ev qet nabe, Pelle fikirî. Jixwe ji ber ku ew li hevdû bûn û Moayê ev nîşan dabû, evqase tişt hetibûn serê wan. Li dibistanê kurik bi kurikan re ne û keçik jî bi keçikan re ne. Wî ev yek bi awayekî vekirî ditibû. Ew nikare vê edetê xera bike. U ku ew Moayê biparêze ê rewş baştir nebe. Wê demê ê zarok piştî xwe bidin wî jî.

Lê Pelle di kûrahiya dilê xwe de jî hîs dikir ku ew tiştine şaş dike. Wî dihişt ku zarok henekên xwe pê bikin. Ev mîna lekeyeke nexweş di nava

sînga wî de bû. U vê êşê dikir, ku ew ji Moayê  
hêrs bibe. Ji ber ku ew xwedî wijdaneke xerab

57

bû. Lê ji ber ku Moa bi dibistanê re lihevdû nedikir,  
wî nikarîbû xwe aciz bikira, wî xwe parastibû.

Wî nikarîbû tiştek jî ji bo vê bikira.

Moa eynî mîna wê pisîka malê ye, Pelle fikirî.

Ew jî bikêrî tiştekî nayê. Ew pisîka ku newêre  
derkeve derve. Ew roja havînê ya germ hate bîra  
Pelle. Kêfa wî ji pisîkê re hatibû, û ew fikirîbû ku  
divê pisîk derkeve derve û hinekî hilma xweş ya  
rojê bistîne. Wî hêdîka pisîk danîbû ser wî geyayê  
devê derî. Ê pisîk cefilîbû. Wê xwe pirnisandibû û  
ji wî dengê ku bayê bi qirşûqalan xistibû qutifîbû.

Ew wisa mexel ketibû û ricifîbû. Pelle mecbûr  
mabû ew biribû hundir dîsa.

Ji wê bi şûn de xelkên dihatin serdanê, hemû bi  
pisîkê dikenyan. Tevî ku ew li gund diman jî,  
wan qutiyek tije zixur kiribûn, ji bo ku pisîk newêrîbû  
derkeve derve mîz bike.

Niha otobus sekinîbû û herdû zarok peya bûbûn.

Dema ku ew wisa bi dû hevdû de bêdeng diçûn  
Pelle fikirîbû: yê ku mîna pisîkê ye, ez im. Yê

58

ku ditirse jî ez im. Ez newêrim carekê tenê jî rahêjim  
destê Moayê.

Medbex vala bû. Tenê pisîka ku xwe xistibû binê  
yan li malê bû, dema Pelle hatibû.

Pisîka-bizdo, fikirîbû Pelle û ber bi hundir ve qê-  
- Rojbaş dayê, tu li mal î?

Lê kesî bersiv nedabû.

59

Dibe ku ew li axur be, yan jî li daristanê ye, yan jî li cem mala Karlsson e, ew fikirîbû. Dibe ku ew li kar jî be. Mirov bi karê dayê tucarî nizanîbû. Ew dikarîbû li nexweşxaneyê bûya jî, ji ber ku ew hemşîre bû. Ji ber vê yekê jî piraniya caran ew bi şevan jî dixebitî. Lê carinan diqewimî wê karê xwe bi hinekan re diguherî. Tevî ku roj jî bû, ew ne li mal bû.

Ger ev berî bi çend hefteyan bûya, berî destpêkirina dibistanê bûya, wê Pelle kêliyekê jî nefikiriya ku dayê çima ne li mal e. Hema ew ê rast çûba cem mala Moayê, û Birgit, dayika Moayê, dê paste û çoqulat danîbûna ber wî wek ku ew li malê be. Lê niha cûda ye. Ew niha nema bi Moayê re digere û ew nema diçe mala wan jî. Ew ji wê roja berî destpêka dibistanê ve neçûye wir.

Pelle fêr nebûbû ku tenê li malê bimîne. Mal wek ku vala be. Bavo li daristanê bû. Yabo terekor û mekîneyên mezin yê şîrketê diajotin, û hîna gelek seat hebûn, ji hatina wî re.

60

Pelle tiştêkî ku bike peyda nekiribû. Ew Moa bû ya ku gelek leyistik peyda dikirin.

Pelle zanîbû ku dayê û bavê meraq dikin. Herwiha

Birgit û Hugo, dê û bavên Moa jî meraq dikin. Dayê kiribû ku bi wî re bipeyive: " Çi qewimî ye? Çima tu û Moa bi hevdû re naleyizin?" Lê Pelle tenê devê xwe biribû û anîbû. Wî bihîstibû dema ku Birgit li vir bû, çawa dayê û wê dixwestin zanibin bê çi qewimiye. Lê Pelle bi xwe jî baş nizanîbû. Tenê ew û Moa êdî nema mîna berê heval bûn. Li dibistanê, keçik bi keçikan re, kurik bi kurikan re digeriyan. Lê şaşî di wir de bû ku Moa bê heval mabû. Lê ma wê Pelle çi bikira. Ew seranserî rojê ji ber vê rewşê aciz bûbû.

Pelle xwe daqûl kiribû û li pisîka di binê yan de bû, nerîbû. Pisîka ku nedixwest ji wir derkeve. Ew di binê yan de mexel ketibû û xwe bi dîwar ve kiribû dirdirk.

Ew birastî jî ecêb e, Pelle fikirî. Mirov vê di çavên wê de dibîne. Tirsonêk û nerehet e. Nîvê dev-61

rûyê wê pembe û nîvê din reş bû. Û tam li ser nîvê jora çavek wê çermekî spî hebû. Birastî jî ew dişibe palyacoyan(qeşmeran), Pelle fikirîbû.

- Pisîka dînik. Derkeve, Pelle got. Lê pisîkê xwe neleqandibû.

Pisîkeke dînikî heye li cem me, Pelle biacizî fikirîbû. Lê li cem mala Moayê çêlikeke pir şêrîn ya pisîkan heye, her wiha du se jî hene, Benny û Lenny. Du taxarên (cinsek ji seyên çîmkin yên almana ye) pir şêrin ku bi mirov re dileyizin û henekan

dikin jî, hene.

Dayê hema çî tîne malê hemû mîna vê pisîkê ne.

Berî zivistanê ew dîsa bi seyekî nexweş hatibû malê. Seyekî kulek. Ew se ji ber xwe ve miribû.

Mirov nikarîbû bi wê re henekan jî bikira. U mirîşk, mirîşkên wan jî hebûn. Lê mirov nikare bi mirîşkan re bileyize, Pelle bi acizî fikirîbû. Yan jî bi çêlekan re.

- Were vir, pisîka tirsonek ya dîn! bi ser pisîkê de qiriyabû. Piştî vê qîrînê pisîkê hîn bêtir xwe bi  
62

erdê ve ziliqandibû. Wê bi çavên xwe yên zerekesk hîn bêtir bi tirs û xof nerîbû. Pelle fikirîbû:

Ez ê niha te ji wir derînim.

Wî, ji dolaba ku firaxên paqijkirinê têde bûn, rahiştibû destikdarê firçê yê dirêj. U ew di zikê pisîkê de rakiribû. Pisîka reben mîna fîşekekê pekiyabû, rast xwe li medbexê girtibû û ji wir jî ketibû piştî dolaba porselen. Nêçîrê wiha dest pê kiribû. Pisîk pir tirsiyabû û hema ji pişt wir jî derketibû û çûbû odeya rûniştinê û Pelle jî bi dû wê de.

Wî di pişt yan, dolabê, gardolabê û sandoqê de cî li pisîkê teng kiribû. Pelle bi dardestikê firçeyê hemû deverên ku pisîkê dikir xwe lê veşêre xiş dikir.

Heta ku ji pisîkê hatibû xwe hilavêtibû û hilkişiyabû ser dolaba pirtûkan û ji wir bi çavên silbûyî li dora xwe meyzandibû. Hema di wê demê de dayê dabû derî. Dayê di nîvê deriyê nîvcî de sekinîbû

û behetmayî li pisîka ku hilkişiyabû ser dolaba pirtûkan û Pelle yê ku darê firçeyê di destê wî de bû, temaşe kiribû.

63

- îca ev çi ye, wê gotibû.

Pelle bi xar dar ji destê xwe avêtibû û xwestibû ji wir here, lê dayê ketibû pêşiya wî. Dayê hema hişk bi çepilê wî girtibû û gotibû:

64

- Ez dixwazim zanibim bê ev çi ye? Ji bo xatirê Xwedê ev tu çi ji vê pisîka reben dixwazî?

Lê Pelle bersiv nedabû. Wî pir fedî kiribû. Ne ji ber ku wî wisa li pisîkê kiribû, ji ber ku dayê bi ser wî de hatibû.

- Niha ez û tu em ê rûnin û bipeyivin, dayê bi awayekî bi biryar gotibû, lê Pelle got:

- Tişteki ku em li ser bipeyivin tune. Hîç jî tune.

- Baş e, dayê gotibû û ew berdabû. Ger tu naxwazî bê ev çi ye tu dikî, wê demê ez jî zorê li te nakim.

Dayê li xwe zîvirîbû û Pelle bi dû wê de nerîbû.

Çima wê nedabû ser wî. Wî hem dixwest û hem jî nedixwest ku dayê zanibe bê wî çima wisa kiriye.

Di derî de dayê li xwe zîvirîbû. Pelle xwestibû bêje:"

Were ez ê ji te re bêjim bê çima wisa bû." Lê

dayê çûbû medbexê û ew dema ku Pelle difikirî ku ji dayê re bibêje jî derbas bûbû.

Piştî demekê dayê dîsa di derî de xuya kiribû û

65

gotibû:

- Mirov çawa dikare û dixwaze zîrarê bide pisîkeke wisa reben. Naaa, ez vê yekê qet fêm nakim. Pisîk li wê jora li ser dolaba pirtûkan hîna jî xwe bi dîwar ve kiribû dirdirk û hîna jî tirsîyayî xuya dikir.

Pelle nizanîbû bê ew çima li Moayê difikire. Pelle dîtibû ku Moa li pişt salona xwarin ya dibistanê ye. Nicklas û Camilla û Roffe û Eva dîsa henekê xwe bi wê dîkin. Wî wek ku ew wan nabîne kiribû. Wî rast berê xwe dabû seheya topê ku Torbjörn û Micke li wir bûn. Ji wê devera ku ev tişt dihatin serê Moayê, ji xwe tişteki ku wî bikira jî tunebû.

Ew fikirî ku ew hema rast here cem mamosteyê û bibêje zarok tiştên nebaş dîkin. Lê nebû. Dê zarok di bêhnberdana din de ji wî re bigotan: " Marê xayîn" û " tirsoneko"

Carnan Pelle meraq dikir bê ka çima Moa wisa xwe li dibistanê gêjikî dike. Moa ya ku dikarîbû

66

bixwenda. Çima wê xwe nîşan nedida? Wê wek wan dikir dema ew bi ser de diqêriyan, wê serê xwe bi jîrekiya xwe nedişand. Carnan diheliqî serê wî ku rabe û bêje ku Moa gelekî jîr e. Wê dema ku zarokan henekê xwe bi wê dîkirin, bi qîrîn û libolibo digotin ku ew hej Pelle dike û wê destûra



wan li xwe dida, hema Pelle dikir rabe bêje;"  
Moa, ew dikare bixwîne. Ew vê yekê ji xwe re  
dihêle. Ew xwe dike qirdik."

Pelle ketibû qelê û zarokên din jî xwe amade dikirin  
ku şûtan bikşînîn. Berê wî tam li wî dîwarê  
ku Moa li ber sekinîbû û zarokan ew aciz dikirin.  
Wî dîtibû ku her çûbû zarok civiyabûn û hey civiyabûn.  
Wî ji bîrakiribû ku ew qelê diparêze.

Micke qîriyabû;

- Çi bi te hatiye! Tu qeleparêz î, yan na?

U Torbjörn gazî kiribû:

- Lo! Ez ê niha li topê bidim!

Lê her ku çûbû zêdetir bala Pelle çûbû ser rewşa

67

Moayê.

- Bisekine, wî ji Tobben re gotibû, ku wan dest  
pê kiribû ji wî re digotin Torbjörn. Ew li wî alî  
tişteke dibe.

- Ohhoo, Tobban gotibû. Tenê Moa ye. Zarok  
tenê wê aciz dikan.

Pelle fêma nekira bê ew çima wisa qeherî. Wî bêyî  
ku haya Torbjörn jî wî hebe xwe çem kiribû wî û  
ew avêtibû erdê. Torbjörn şaş mabû.

- Ev çi bi te hatiye? Ev tu dîn î? qîriya Tobban.  
Lê Pelle li zikê wî û li çepilên wî û hama ku derê  
wî ketibû ber lêdabû. Heta ji wî hatibû wî kulm li  
wî dabûn. "Tenê Moa" bi xezeb ew fikirîbû. "Tenê  
ew Moa ye ya ku tê acizkirin û qeherandin,

ha." Moa ya ku ew ji wê hez dike. Çima wisa hemû li dijî wî ne.

Lê Tobban ji wî bi hêztir bû. Wî zû Pelle serpişt avêtibû erdê û bi destên wî girtibûn.

- Ev tu çima wisa dikî, min tişteki xerab bi te nekiriye, wî gotibû.

68

- Min berde! Min berde! Pelle qîriya.

Tobban dîtibû ku hêsirên Pelle bi ser hinarkên wî de dibarin û ev ne leyistik e. Wî ew berdabû.

Niha Pelle zanîbû bê ew ê çi bike. Ew ê ji min jî aciz bibin, ew fikirî. Ew ê nema karibin Moayê aciz bikin. Ew rast çûbû nava koma zarokan.

Tobban û Micke hêdîka bi dû wî de hatibûn. Mirov dikarîbû bidîta ku ew difikirin: " ewê niha tiştin biqewimin."

Moa hatina wan dîtibû. Pelle li pêşî bû. Acizî û qehreke ecêb di nava wê de hebû. Ji ber ku Pelle destûr dida ku zarok wilo li wê bikin. Gelo ew ê niha were û alîkariya wê bike. "Xwedayo tu bibîn!" wê di nava xwe de gotibû. Wê tenê ev dua zanibu.

- Qebûl bike, tu dixwazî ku Pelle te maçî bike, Camilla bi dengekî zirav î tûj gotibû.

Moa tişteki jî negotibû.

- Pelle û Moa, Pelle û Moa! zarok hemû qîriyabûn.

Û Nicklas rast çûbû ber wî û bi dengekî zelal

69

gotibû:

- Bêje zû! Bêje zû, hûn ê çî bikin!

Niha Pelle geheştibû cem wan. Moayê çavên xwe girtibûn û xwestibû ew bimire.

Dema zarokan dîtibû ku Pelle tê, ew bêdeng bûbûn.

Zarokan rûyê Pelle yê tirş û tal û qermiçî dîtibûn,

hema hemûyan xwe ji ser riya wî dabûn

alî. Hemûyan ecêbmayî û tirsîyayî temaşe kiribûn.

Wan nizanîbûn bê wê Pelle çî bike. Wî bi

awirên tûj li Nicklas û Camilla û Roffê ku xwe

gavekê paş de dabûn meyzandibûn. Ew fikirîbûn

ku niha wê Pelle xwe çem bike wan û bi wan re

şer bike. Lê wî xwe rast li Moa ya ku li wir çavgirtî

sekinîbû, girtibû.

- Were Moa. Were bi min re.

Moa çavên xwe vekiribûn. Lêvên Pelle biçûk

bûbûn, eynî mîna dema ku ew aciz dibû. Lê ew

ne ji Moayê aciz bûbû. Wî bi destên wê girtibûn û

zarokan jî xwe dabûn alî. Dest di dest de ew ji nava

koma zarokan derketibûn. Kesekî tişteke nego-

70

tibû. Nicklas devê xwe jî venekiribû.

Pelle, Moa bi xwe re biribû cem seheya futbollê.

Tobban û Micke yên ku bi berdewam bi wî re

bûn bi ecêbmayî li wî temaşe dikirin.

Wî ji wan re gotibû:

- Moa dê bi me re be. Di dunyayê de tu kes nikare

mîna wê li topê bide. Em li malê dileyizin.

Ha ji we re top! Lê bidin!

71

Dotira rojê Moa û Pelle li kêleka rê sekinîbûn û li benda otobosê bûn. Destê wan di destên hevdû de bûn, eynî mîna roja pêşî. Pelle hişk bi destê Moa girtibû. Wî pir meraq dikir ka dê Axel, ew yê ku otobos diajot çî bêje. Û wî bersiva xwe amade kiribû: " Tu li karê xwe binere.", ger Axelê şofêr di derbarê hezkirin û tiştên wisa de gotinên beredeyî bikira. Lê ew ê newêribe. Ew ê bêje: " Ev bi serê te neketiye" yan jî "te eleqeder nake?" Niha otobus hatibû. Mezin û şîn tevî lewheya zarokan.

Pelle li doh fikirîbû. Wê roja berê. Berî ku ew nema bi hevdû re bipeyivin. Berî ku Pelle dev ji wê berde. Berî ku Moa wisa tenê li dibistanê bimîne. Li wê dera ku destê Moayê di destê Pelle de bû, wî xwe ji binî ecêb hîs kiribû. Ew heyecan û teswasa di dilê wî de çûbû.

Niha otobos sekinîbû. Moa û Pelle lê siwar bûbûn. Lêvên Pelle biçûçik bûbûn û ew difikirî: Te-  
7\*

nê ez diwêrim bersiva wî bidim. Lê îro Axel bi lez bû. Ji xwe wî ferq jî nekiribû ku Moa û Pelle bi destên hevdû jî girtine.

73

AU

Çîrokeke evînî

Moa û Pelle du heval in. Lê ya wan ji hevaltîyê

wêdetir tişteki din e. Di navbera  
wan de hezkirinek heye, lê Pelle cesaret  
nake ku hezkirina xwe diyar bike.  
Nivîskara vê kitêbê Kerstîn Johansson  
Backe zarokan û cîhana zaroktiyê baş nas  
dike û dike ku hem zarok û hem jî mezin  
xwe di kitêbên wê de bibînin. Ev çîroka  
evîni ya du zarokên dibistana destpêk jî  
serpêhatiyeke welê ye. Di vê kitêbê de zarok  
zaroktiya xwe dijîn, mezin jî li zaroktiya  
xwe vedigerin ...

NÛDEM

\*\*

## NÊÇÎRA ROVÎ

Nivîs û wêne: Sven Nordqvist Navê orjînal: Ravjakten

Nêçîra Rovî

Wergera kurdî: Mustafa Cizîrî Redaksiyon:

Ahmet Cantekin, Amed Tîgrîs,

Ali Çiftçi, Mustafa Cizîrî

Çap: Aarhus Stiftsbogtrykkerie, Danmark-1995

© Mafê weşandina kurdî: Weşanxaneyê Apec

Utgivare :

Apec- Porlag

Box: 3318, S-163 03 Spangay'Sweden Telefon 08-761 81 18

Telefax 08-761 2490

ISBN: 91-87730-82-2

Nêçîra Rovî Sven Nordqvist

ISBN: 91-87730-82-2

## APEC

Mam Mendo û pisîka wî Finda bi hev re di xaniyekê de diman. Xaniyê wan di nav daristanekê de bû. Di hundirê êzingxaneyê de bi têra wan êzing û di koxa mirîşkan de jî çend mirîşkên wan hebûn. Di xaniyê necartiyê de jî hemû alet hebûn. Mêvanên Mam Mendo pir nedihatin. Lê, ew ji rewşa xwe gelekî razî bû.

2.

Rojekê cîranê wan, Goşto çifteya wî li milê, benê kûçik di dest de, hat. Pir bi hêrs xuya dikir.

- Rojbaş! Mam Mendo! Ma te tu pêjna rovî li van deran nekiriye?

- Na, min tu pêjin nekirine. Bi qasî ku ez dizanim tu rovî nehatine van deran.

Goşto di ber xwe de got: - Ez bawer dikim ku rovî hatiba van deran, dê te ew dîtiba. Xuya ye nehatiye. Ew dizê mirîşkan e. Şeva çûyî ji koxa min mirîşkek biriye. Lê ew dê nikaribe careke din were û bibe. Heger careke din ez wî bibînim, ez dê bera wî bidim. Mam Mendo tu jî îro çifteya xwe derxe û amade bike. Dema rovî bibîne ku min mirîşkên xwe kirine koxê û derî asê kiriye, dibe ku vê carê bi aliyê we de bê! Goşto got û ji wir çû,

3.

Mam Mendo di ber Awe de got: - Na lo .. Tu bawer dikî ku îşev rovî were û bi dû Goşto de nihêrî. Wê demê baştir e ku em bi carekê re mirîşkên xwe têxin hundir 11 derî li ser wan bigirin. Ma ne weha ye Findo? Dema ku Goşto bi kûçikê xwe ve hatibû, pisîk hilkişiyabû ser fotêra Mam Mendo. Findo bi çavên beloqî bi dû wan de nihêrî II got: -Di şûna mirîşkan de Goşto bixe hundir û dêrî li ser bigire, baştir c. Ez bawerî bi mirovên bi tîfing nakim. Mendo kenî û got: -Tu hez nakî ku ew bera rovî bide? An jî dê rovî bê II mirîşkan bixwe. Findo got: -Divê mirov bera roviyan nede. Mirov dikare wan bixapîne. Ez her dem wan dixapinim.

Mam Mendo kir kiş-e-kiş II got: - Belê, ez dikarim li ser bifikirim ... Erê, ez bi te re me. Guneh e ku mirov rovî bikuje. Em dê li ser bifikirin, riyekê peyda bikin û wî bitirsîn ku ew careke din nikaribe mirîşkekê jî bixwe.

Mam Mendo destpêkir, ponijî û ji bo ku bikaribe çareyekê bibîne. Dema ku fikreke baş an jî nebaş dihatin bîra wî, di ber xwe de dikir hime-him. Di dawiyê de berê xwe ber bi jor ve kir II destê xwe da ber devê xwe LI OHI pif kir. Paşê di ber xwe de kenî û got:

- Ma li mala me îsotên sor hene? Finda got:

- Her dem çend kîlo li malê peyda dibin. Mam Mendo got:

- Wê demê em dê herin II mirîşkekê çêbikin. Ji bo ku rovî te negire, baştir c, tu jî bi min re bêyî hundirê xaniyê necartiyê.

- Finda kir miyawww ... û got; ew nawêre. Lê, dîsa jî bi wî re çû.

Di xaniyê necartiyê de pir tiştên ku mirov bikaribe pê rovî bitirsîne, hebûn, Mam Mendo baloneke spî lî biçûk II têlek ji qutiya solan derxist. Bi dû re sindoqa kevin a ku li ser refê bû, ber bi xwe ve kişand II serûbin kir. Bi rûyekî tirş û tal:

- Kanê îsot Findo? Divê di vir de bûya lî ne li cîhekî din! Tu baş dizanî ku ez tiştên xwe têkuz datînim lî serûber dikim.

Findo bi nermî got:

- Tiştê ku ez dizanim li jê haydar im, me tu carî îsot nekiriye sindoqê. Em her tim dixin zembîla pisikletê . Divê te zanîbûya. - Erê lê, tu rast dibêjî, Mam Mendo got û kîsê îsotê ji zembîla pisîkletê derxist. Heta çûyê, bi kovikê îsot kirin hundirê balonê. Piştî pifê balonê kir, hindik mabû ku balon biteqe.

4.

Niha hewcedariya me bi hinek periyan heye. Ma çend perî li ba te tune ne Finda? Pisîkê got: -Na, li ba MIN perî tune ne. Ji Pcriberfê bipirse. Perî

berf mirîşka herî girs û girover bû. Wê di kuleka di navbera odeya necartî  
II koxê de, bi dizî li wan guhdarî dikir.

-Peribcrf Ji bo em rovî bidin tirsandin, pêwîstiya me bi çend periyên heye.  
Ew ji bo parastina we yc. Divê her yek ji we çend periyên bidin. Pcriberfê  
nikilê xwe rakir û hejand û çû cem mirîşkên din. Dema wan dikir qid -qid  
û gilî û gazine xwe dikirin, Mam Mendo têt li dora balonê dizivirand, qirik  
û lingên wê jî tamam kiribû. Pcribcrf hêdî hêdî ber bi wan hat û kîsek tijî  
perî danî ber wan. Bi dengekî gur ÎÎ xurr Perî berfê got:

-Binihêrin, em periyên xwe bi paş ve dixwazin ha!

Mam Mendo got: - Erê, erê, em dê bi paş ve bidine wc.

Destpêkir û perik bi balonê ve zeliqandin. Wî nikil, kumê sor II boçika wê  
jî çêkir. Pisîkê jî alîkariya wi dikir. Dema karê xwe qedandin, balon hema  
hema wek mirîşkeke rasrîn bûbû.

Findo got:

- Bi rastî wek mirîşkeke xweşik bû! Em dê bi vê çî bikin lo? Mam Mendo  
bi şahî got: -Rovî dê wê bixwe!

Dema rovî êvarê bi dizika, "hêdî-hêdî" bê û çavên wî bi mirîşka bi tenê  
bikeve; av dê ji devê wî here ... Ew dê hema bazde û xwe bavêje ser  
mirîşkê û gez bike. Wê demê mirîşka balonî dê biteqe: "PANG! ... " Rovî  
dê bitirse û solix jê qut bibel... Îsot dê bikeve dev û bêvila wî, dê bipişke  
îl tire erdê bike. Ew careke din mirîşkekê naxwe! ... Hemû mirîşkan li  
çepikan xistin û Findo jî bi  
xwe Mendo gelekî serbilind û şa bîl.

- Tu baş fikirî Mam Mendo!

5.

Ew bi hev re çûn hewşê û mirîşk bi cîh kirin. Bi hev re lê nihêrîn. Findo  
got:

- Gelekî xweş çêbûye, Mam Mendo got:



- Erê, erê pir xweş bûye. Demekê bêdeng rawestiyên II ponijîn. Findo got:

- Ez nizanim ew tiştên ku me heta niha pêk anîye bes e, yan na? Ez dibêjim, va ye em hewqes pê da ketin, em hinek tiştên din jî bikin ji bo ku zêde tcqini II reqini bibe. Wê demê ew dê baştir fêma bike II tobe bike ku careke din bi aliyê mirîşkan ve neçe. Mam Mendo got:

- Kêfa te ji teq II reqinîyê tê ne weha?

- Na, ne hewqas! Lê, ez wan mirîşkên belangaz difikirim.

Mam Mendo got: - Erê, erê, ez dizanim ku tu wan difikirî. Destê xwe da ber guhê xwe II ket nav gumanan.

- Ez bawer dikim, em wekî te bikin, dê baştir be. Em dikarin hineke teqemenî jî bixin nav ji bo ku ew fêma neke ku çi lê qewimî. De zû bike, bide dû min, ji bo ku mirîşka baloni bi te de ncteqc.

Findo kir rniyawww ... tî got:

-Ma ez rovî me ku bi min de biteqe. Lê, dîsa jî da dû Mam Mendo û çû .•  
6.

Mam Mendo çû ket hundirê xaniyê necartiyê û yek bi yek li qutiyên boyaxê yên kevin ku li ser sobeyê bûn nihêrî.

- Kanê! Kanê teqemenî? Bi awirek} tûj li Findo nihêrî.

- Duh û pê qutiyên me tijî teqemenî bîm? Ma çi bi wan hat Findo?.

Findo bi sebir got:

- Qasî ku ez pê dizanim, her tim li ser refê li kêleka dêrî ne.

- Mam Mendo di ber xwe de kir pite-pit û got:

- Erê lê, dikare wusa be! Rast e.

Mam Mendo berîkên xwe tijî teqemenî, firil û raket kirin. Heste jî k.ir berîka xwe.

7.

Paşê çûn derve tl derdora bi teqemeniyan rapêçan. Mam Mendo hemû teqemenî bi fitilekê, bi hevûdu ve girêdan. Di bin deriyê derve re, fitîl kişand hundirê malê. Paşê fitil di salonê re bir hundirê odeya razanê, heta ber texteyê ku li ser radizê, anî. Qutîkek derbik amade kir û da ber.

\_ Ha weha ha.' Divêew têra ku rovî baş bitirsne bike. Dema rovî êvarê bê, dê xwe

bavêje ser mirîşka balonî. Dema ku dev lêbike, dê biteqe. Wê demê dê deng bê me. Dema deng hate me, ez dê rabim lî agir bi fitîlê bixim. Dûre gurminî dê bi teqemeniyan bikeve. Derûdorên hewşê wekî brûskan dê bike şeqinî û teqînî. Wê demê, ez dê bibînim ka rovî ditirse yan jî na. Belê, ez dê wê demê rewşa wî bibînim ... Findo bêdeng li fitîla teqemcniyan dinihêrî û paşê weha got:

\_ Bi rastî rovî dîn in. Ez meraq dikim dê çend teqemenî têra wî bikin ku baş bitirse' Ku ew careke din neyê diziya mirîşkan. Lê, em hewqas pê da ketin, em şele-peleyekê jî pêve bikin, da riya ber lingê xwe jî careke din nebîne, dê hîn baştir be'

Mam Mendo kir him-him û got:

- Himm ... Tu 1'1 şele-peleya tel ... Na ... na! Bi baweriya min hewqas bes e. Lê, dîsa jî destpêkir 1'1 pêre li ser fikirî; ka çawa dê bikaribe riyeke tirsê peyda bike. Her ku ew difikiri, tiştên xweştir dihatin bîra wî. Ew çû nava hewşê sekinî û li çep û rastê xwe temaşe kir. Dûre berê xwe ber bi jor kir 1'1 got:

- Em dê niha, li wir hêlanekê jî çêbikin. Findo, baştir e ku tu jî bi dû şopa min de werî, ji bo ku tişteke bi te de neteqe. Findo kir miyawwww - rniyaww û got: - Ev çi gotinên vala nel. Lê, dîsa jî da dû wî û çû.

8.

Mam Mendo da ku tişteki peyda bike, rabû ser xwe û çavên xwe li aletên neçartiyê, yên ku bi darvebûn, gerand.

- Werîsekî MIN î dirêjjjj hebû, Min ew xweşik li hev kiribû gilok û danîbû quncikekî. MIN ew bi wî bizmarê han ve daliqandibû. Wa ye di şûna wê de kçmanek daliqandine! Findo, te dîsa canbaziyekek nekiribe?

Findo bi awayekî acizbûyî xwe civand ser hev û got:

- Te tu caran werîs bi wî bizmarî ve daneleqandine, Mam Mendo. Te ew xistibû hundirê tekerê.

- Erê, erê, bila wekî te be ... Ê di ber xwe de kire mirte-mirt (1 werîs ji hundirê tckcrê otomobîlê derxist. Paşê destpêkir, li çarşefê û çirika ku bi rnixeki ve daliqandibû, geriya.

9.

Paşê çû derve. Seriyekî wêrîs bi xaniyê mezin ve û seriyê din jî bi dara li aliyê din ve baş girêda. Paşê jî çirik pêve daliqand.

- Finda were vir û xwe li ser hêlanê bixwişîne.

Pisîk bi nêrdiwanê hilkişiya û çû jor. Mam Mendo çarşeflê pêça û jê re got; ku pisîk dê çawan xwe bigire û çî bike. Paşê ew berda. Xijînî bi pisîkê ket PîîÛÛVVV ... " û di çend saniyan de gehîşte wî aliyê hewşê. Dûre xwe avêt ser darê.

Mam Mendo got: -Gelekî xweş bû. Em dê weha bikin. Dema ku min êvarê agir bi teqemeniyan xist, tu jî baz de ser xênî û çarşefê li xwe bipêçe. Dema gurminî bi teqemeniyan ket û dengê teqînî û şcqiniyê hat, tu jî xwe bi çirikê ve bigire û bihejîne. Dema tu hatî ser serê rovî, heta ji te tê biqîre û bêje; "DIVÊ TU MIRÎŞKAN NEDIZÎ!" Wê demê divê ew baş fêm bike.

Findo got: -Erê, pêwîst e weha be.

Niha ew dê derban bibîne. Hîn ev nîna ye, tirnina maye! Bi ser de jî teqemenî û pîrewoki jî re dîyarî ne.

Mam Mendo got: -Ez bawer dikim niha hewqes bes c . Em niha êdî herin hundir û qehweyekê vexwin.

Kêrnaniyek mabe jî, cm dê dûre tamam dikin.

10.

Îşev dê şeveke pir bi heyecan û xweş be. Ben ku tan be, Mam Mendo hemû mirîşk kom kirin (1 kirin mitfaxê. Wî ji wan re got; divê ti kes ji we dengê xwe neke. 'Bi dû re hûn divê, hemû şevê, bi dorê li paş gula li ber pencereyê nobedariyê bigirin. Kê ji we rovî dît, divê bi lez bê (1 Mam Mendo hişyar bike. Mam Mendo êvarê çend caran derkete derve (1 çavnêriya mirîşka balonî kir. Ka ew li cîhê xwe ye, çirik bi hêlanê ve ye û teqemenî jî li cîhên xwe ne, yan na!

11.

ew di xewa şîrîn tl xweş de ne, dê rovî bê. Rovî dê êrîş bike û devê xwe bavêje mirîşka balonî. Gurmîn II xurmini dê bi mirîşka baloni bikeve II biteqe. Wê demê ew jî dê bi dengê wê hişyar bibin. Mam Mendo dê agir bi fitila raketê bixe. Findo jî, dê bazde ser xênî. Dema xurmîn û gurmîn bi rakctan ket û qiyamet li hewşê rabû, Findo jî dê pê re xwe bavêje ser hêlanê û xwe bihejîne û bêje: - 11 DIVÊ TU MIRÎŞKAN NEDIZÎIII Wê demê rovî dê wenda

12.

Dê îşev weha bibe. Dibe ku di çend saetan de, dema ew razan, piştî çend deqîqeyên din! piştî saniyekê!

13.

Findo êdî westiya bû. Bîhna.wî teng bîl Ê kete xewê. Lê, Mam Mendo nikaribû razê. wî xwe dirêj kiribû û di tariyê de guhdarî dikir. Her der bêdeng bû. Weyyyyy gidî! Ji nişka ve dengê hat. Dibe ku ne tiştek bîl, yan jî di tariyê de tiştek hatiye ber çavên wî? Ew ji nav livînên Awe rabû û bi dizîka di odeya mezin re li derve nihêrî. Dît ku rovî li wir e. Ew li dora

koxa mirîşkan bîhn dike, diçe û tê. Lê pir bi tirs xuya dikir. Ew jar bîl. Ji lingekî xwe yê dawî dikuliya. Mam Mendo fikirî:

- Dibe ku ji ber vê sedemê diziya mirîşkan dike. Ew nikare baş bazde û kerguhan bigire. Heger em agir bi raketan bixin, dê dilê wî bisekine. Dilê min naxwaze ku ez agir bi raketan bixim.

14.

rovî bi mirîşka balonî ketin û hêdî hêdî di nav hewşê de, ber. di mirîşkê ve diçe. Li hember mirîşkê, di cîh de sekinî. Hêdî hêdî bihn kir, bazda û çû piştta xênî . .Mam Mendo çû ber pencereya paş û nihêrî, ka çi bi rovî hati Wî xwe di ser bendê hewşê re avêt wî aliyê hewşê li bi paş de vegeerî û li xênî nihêrî. Dilê Mam .Mendo pê şewitî û'gunehê wi pê hat . .Mam .Mendo got:

- Gelekî heyf tl guneh e ku Goşto wî bikuje .

. Rovî di nav tariyê de sekinî bû û bi zorê dihate xuya kirin. Saeta dîwêr hêdî hêdî dikir tike-tik .. n Her der bêdeng bû ....

tû dikir. Pindo wekî

bû, bi hewa-ker û kire qîrîn! ..

BI FITÎLÊ VE DAYNE

15.

Êdî ti deng nedihatin bihîstinê. Raket xelas bûn û pisîka pîrewok jî hilkişiya ser darê û wenda bû. Kûçik bazda û çû. Goşto şaş LI matmayî li der û dora xwe dinihêrî. Bi tenê raketeke neteqiyayî mabû. Wê jî hêdî-hêdî pifffff.. pifffff: dikir. Goşto lerizî, veşelişî II bazda ....

16.

Piştî derdor ferikî II bêdeng bû, find 0 xwe ji ser darê avêt jêr II hate hundirê mitfaxê. Mam Mendo li wir rûniştibû û dikeniya. Mam Mendo got:

- Te qenc û xweş kir Findo. Ne wekî ku em fikirîn çêbû, lê dîsa jî ez bawer dikim, rovî jî têra xwe tirsîya û ew careke din nema bi vir de bê.

Findo got: -Çawan yanî! ... Ew ne rovî bû, Goştî bû! Em bi ser neketin.

- Erê erê ez dizanim. Dema tu razayî bû, rovî jî hat. Lê, wî nexwast mirîşka balonî bixwe. Ew li pişt bendê hewşê bû û li şeqîni II gurmîniya rakctan dinihêrî. Wî dît ku mirîşka balonî jî çawan teqiya. Ji ber wê jî wî xwe şaş kir! Piştî ku teqemenî xelas bûn, ew raste-rast hate hundirê mitfaxê, nav mirîşkên ku şaşmayî li wî dinihêrîn. Lê wî qet tiştêk bi wan nekir. Ew hewqas tirsîya bû ku hema bi carekê ve paşve çû. Wî bawer dikir ku ew jî dê biteqin! Lê, wî dîsa jî, peloka çikolatayê ku me dê wek paşşîv bixwara, dizî.

Findo got:

- Ew çi roviyekî fênek û fêlbaz e. Lê ne xem e, bila bidize. Bila ew jî diyariya me be. Tu dikarî peloka çikolatayê ji nû ve, ji me re çêkî, ne weha ye Mam Mendo? - Erê, erê, ez bi dilşahî çêdikim!

Ferhengok

xanî

êzingxane kox

necar necartî alet rewş çifte

xuya dikir pêjn ponijî

asê kiriye fotêr bifikirin têkuz

zembîl kîs

pen

teqemem

rapêçan diaxif hêlan keman çirik

111IX

çewt lerizî ferikî qenc pîrewok

mal

cîhê êzingan pin, komas xerat  
xeratî  
alav, hac et  
hal, weziyet tifinga bi du lûle dihat xwa bûnê  
ku hinê tiştan hîs bike bi tirki; ugultu hizirî, ket gumanan( dalmak)  
derî pêt girtiye  
şewqeyê lengerî  
bihizirin  
bi rêk û pêk, rindik û xweş bi cîh kirin quf, sepet  
tûrik  
perên mirîşkan, penet fişeng, teqteqoq  
tijî kirin, raxistin dipeyivî, qise dikir lînbana  
aletekî mûzîkê lox, çerx, bizmar  
şaş hezî  
sakin, bêdeng baş  
pîrik, cin

Mam Mendo, pisîka wî Findo û çend mirîşk di nav daristanê de, di xaniyekî de diman. Rojekê cîranê wan tê seredana wan. Ew dibêje ku ew dê here nêçîra rovî.

Ev pirtûka xweşik û tiji fantazî, li ser dîtina Mam Mendo û Findo ye. Hîm dê di vê pirtûkê de, pîlan û ramanên wan ku ew dê çawan hem mirîşkan û hem jî rovî biparêzin, bi heyecan bixwînin.

APEC

ISBN: 91-87730822

\*\*

## PÊLAVA BIRÎNDAR

Dema ku polîsan xalê min girtin, bi henekî  
wiha jê pirsîn, „Em pêlavên te yekoyek ji serê

çiyê top dikin, tu çima xwedî li pêlavên xwe dernakevî, şev ji nigê te derdikevin û her yek dikeve nigê terorîstekî...”

Ji bo ku her kes bitirse, deh pêlavên wî li gundiyan belav kirin û cendekê wî avêtin ser sergoya gund.

Ji tirs kesî li cendekê wî jî nepirsî.

Dû re hate bîra min...

Ez hingê zarok bûm.

Xalê min bi pêlaveke xwe ya nû ve ji mal derketibû û bi pêlaveke peritî ve vegeyriyabû.

Wê şevê jinxala min pê re şer kiribû, „Tu yê serê me bixî belayê heyran, heke sibe kesek vê qulelê di serê pêlavê de bibîne, wê sedîsed fêmbike ku guleyek lê ketiye...”

Wê zivistanê her kesî bi tirs behsa pêlavên xalê min kirin.

Pêlavên birîndar ên xalê min dû re ketin nav xewnên min jî.

HAN Çîrok

HAN Çîrok Evdile Koçer Pêlava birîndar

Evdile Koçer

Pêlava birîndar

ISBN 978-3-940997-01-2

1

Pêlava Birîndar \* Evdile Koçer

2



Pêlava Birîndar \* Evdile Koçer

Berlin-Îlon-2010

Weşanên Han: 46

Çîrok: 4

Edîtor: Zeynel Abidîn Han

Berg Design: Gazîn Onur Han

Çap û Girêdan:

HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur

Ceanachstr. 62 12157 Berlîn

Tel.: + 49 (0) 30 47987052

Fax: + 49 (0) 30 47987054

[www.evra-kitap.com](http://www.evra-kitap.com)

[han-grafik@hotmail.de](mailto:han-grafik@hotmail.de)

ISBN: 978-94040997-20-03

3

Evdile Koçer

Pêlava Birîndar

HAN Çîrok

4

5

Evdile Koçer

Di sala 1977'an de li Sêrtê hatiye dinyayê.

Heyamekê li Zanîngeha Uppsalayê ya li Swêdê li ser ziman û wêjeya kurdî ders wergirt.

Heta niha gelek nivîs û çîrokên wî di kovar, rojname, antolojî û malperan de derketin.

Her wiha çîrokên wî bûn şano û wergeriyan ser gelek zimanan.

Pirtûkên wî

- Govendistan (Weşanên Pêrî – 2002)
- Mirin (Weşanên Aram – 2006)
- Koçername (Weşanên Do – 2009)
- Pêlava birîndar (Weşanên Han – 2010)

Têkilî:

E-mail: [evdilekocer@yahoo.com](mailto:evdilekocer@yahoo.com)

Malper: <http://evdilekocer.blogspot.com/>

Facebook: <http://www.facebook.com/evdile.kocer2>

Twitter: [http://twitter.com/Evdile\\_Kocer](http://twitter.com/Evdile_Kocer)

Youtube: <http://www.youtube.com/Gulanbihar>

6

7

Qelûn

Ew xwediyê qelûneke navdar bû.

Bi qelûna xwe ve li bajarê xwe her dem gilî û gazinc dikir.

Bi qelûna xwe ve her dem digot, "Li vî bajarî tiştê naguhere!"

Bi qelûna xwe ve rabû terka welêt kir.

Bi qelûna xwe ve piştî 34 salan dîsa vegeriya bajarê xwe.

Bi qelûna xwe ve dît ku her tişt guheriya.

Bi qelûna xwe ve dev ji gilî û gazincan berda.

Rabû dev ji qelûna xwe jî berda.

8

Bawerî

Rojekê ji Xwedê û pê ve ji tu tiştî bawer nedikir.

Çax û dem di ser re derbas bû.

Rojek hat ku ji bilî Xwedê ji her tiştî bawer kir.

Çax û dem di ser re derbas bû.

Demek hat ku êdî ji tu tiştî bawer nekir.

Çax û dem di ser re derbas bû.

Mir.

9

Girtîgeh

Gerîlayek...

Leşkerek...

Di qada şer de li dijî hev şerekî dijwar kiribûn.

Lê wekî îroniya jiyanê ketibûn heman girtîgehê.

Serê pêşîn bi pêşfikirînen mezin ve nêzîkahî li fikrên hev kiribûn.

Di girtîgehê de li dijî bîr û rayên hev bi mehan ketibûn qirika hev.

Her yekî dixwest yê din qane bike û bîne ser fikra xwe.

Hindik mabû ku li wir jî serê hevûdu di xwînê de bihiştana.

Ji mecbûrî bi hev re gogê leyîstin, di kişikê de zora hev birin.

Dû re hêdî hêdî nerm bûn, li hevûdu gohdarî kirin.

Di nava çar dîwaran de xewn û xeyalên xwe ji hev re par ve kirin.

Têrê nekir...

10

Rabûn xewn û xeyalên xwe bi zimanê xwe yekoyek

nivîsandin...

Têrê nekir...

Rabûn fêrî zimanê hev bûn...

Têrê nekir...

Rabûn bi hev re bi zimanekî çîroka xewn û xeyalên xwe nivîsandin...

Têrê nekir...

Rabûn çîroka xwe kirin senaryoyek balkêş û şandin ji derhênerê navdar re.

Derhênerê navdar di nava xirecira kar û barê xwe de bi tesadûfî vê senaryoyê xwend û gelekî li xweşa wî çû.

Xwest ku hema di cih de bike fîlm.

Wisa jî kir: Pê wê senaryoyê fîlmekî gelek xemgîn û balkêş kişand.

Di sînemayan de hêsirên mîlyonan kesî li ber wî fîlmî rijyan.

Ew fîlm li ser rihê bi sedhezaran kesî bandorek mezin hiştibû.

Paşê derhênerê navdar bi kampanyayeke mezin ve xwest ku ew leşker û gerîla ji girtîgehê derkevin.

11

Ji bo serbestberdana wan bi sedan kesî hema bêje her hefte li ber wê girtîgehê xwepêşandan çêkirin.

Di dawiyê de bi ser ketin.

Gerîlayek...

Û leşkerek...

Wê sibe ji girtîgehê derkevin.

12

Tirs

Ji tenetiyê gelekî ditirsiya.

Dema ku mêrê wê ji bo du sê rojan ji mal diçû, pêlava wî datanî ber devê derî.

Lê rojekê ew pêlav dizîn.

Pêlavek din danî ber devê derî.

13

Koleksiyona Pêlavên Leşkeran

Em bi hev re mezin bûn.

Dema biçûk bû, pêlavên leşkeran boyax dikir.

Çaxê mezin bû, pêlavên leşkeran maçî dikir.

Gava pîr bû, ji pêlavên leşkeran koleksiyon çêkir.

Dema mir, koleksiyona pêlavên wî pê re veşartin.

14

Nivîskar

Her duyan jî bi xêra pirtûkeke wî nivîskarî hevûdu nas kirin.

Havêna evîna wan jî li wê pirtûkfiroşa bajêr hate avêtin.

Gelekî hez ji hev kirin gelek.

Bi hev re zewicîn.

Lawikekî wan jî çêbû.

Navê wî nivîskarî lê kirin.

Piştî salan nivîskarê ku wan pir hez jê dikir, ji bo

îmzekirina pirtûkên xwe hate pirtûkfiroşa bajêr.

Xwedê heye pir kêfxweş bûn, hindik mabû ku bifiriyan.

Bi lawikê xwe ve beziyan çûn wê derê.

Li ser navê lawikê xwe hemû pirtûkên wî pê dan

îmzekirin.

Bi vî awayî nivîskarî jî nas kirin.

Dû re bi wî re ketin nava sohbeteke xweş.

Sohbeta wan vegeriya nava nîqaşeke tûj û dûvedirêj.

15

Tiştêkî nexistin serê hev.

Zilam û jinik vegeriyan malê.

Li malê jî nîqasha xwe ya tûj berdewam kirin.

Tiştêkî nexistin serê hev.

Wê şevê biryarek dan: Ji hev veqetiyên.

16

Panzer

Mamoste karek da wan ku wê li malê pêlîstokeke erebeyan çêkirina.

Her yekî pêlîstokek çêkir.

Şagirtê tirk erebeyeke kevin ya Atatürk çêkir.

Şagirtê kurd panzereke pêlîstok ya almanî çêkir.

Şagirtê alman erebeyeke ku dipeyîviya çêkir û wê şevê ji bavê xwe re wiha got, "Bavo, hevaleyê min van fikrên te yê panzeran ji xwe re kiriye pêlîstok û doh anî dibistanê..."

17

Pêkenokên Şer

Karê wî her ew bû: Di dema şer de pêkenokên şer berhev dikir û dinivîsand.

Bi van pêkenokên xwe ve deng dabû, navdar bûbû.

Bi xêra pêkenokên wî tîqetîq bi ser her kesî diket.

Tenê xeyaleke wî hebû.

Dixwest van pêkenokên xwe çap bike.

Şer qediya.

Ji çiyê daket bajêr.

Bi pêkenokên xwe ve li deriyê weşanxaneyekê da.  
Bi kêfxweşî vê daxwaza xwe ji wan re vegot.  
Edîtorê weşanxanê bersiveke ne bi dilê wî da, "Şer  
qediya, êdî tu kes bi van pêkenokan nakene ezbenî!"

18

Qêrîn

Dixwest ku biqêriya.

Lê nedizanî çawa.

Rabû xwe fêrî qêrînê kir.

Camêr bi ser jî ket.

Lê dema ku fêrî qêrînê bû, êdî nedixwest ku biqêriya!

19

Bêrîkirina Welêt

Wekî gelek kesên sirgûnbûyî ewê jî nedikarîbû biçûya  
welêt.

Di civatan de dema ku yekî behsa bêrîkirina welêt bikira,  
wekî bersivekê ew jinik dihat bîra min.

Min çend car ew li balefirgeheke Berlînê dîtibû.

Bi çavê ku têhna bêrîkirina xwe ya welêt bişkêne li  
rêwiyên ku wê biçûna Amedê temaşe dikir.

Li gorî gotinan bi kefiya xwe ya keskûsorûzer ve çend  
car ketibû dora kontrolê jî.

Lê her dem bi stûxwarî vedigeriya mala xwe.

Rojekê bi wê balefirê cendekê wê şandin Amedê.

Hingê têhna bêrîkirina wê ya welêt jî şkestibû.

20

Hêvî

Bi hêviyeke mezin ve dixwest çîroka 'Hêvî'yê binivîse.

Bi dilhêvî li ser rûpeleke spî 'Hêvî' nivîsand.

Lê bêhêvî ma.

Hêviya wî şkest.

Tu gotin nehatin bi hêviya wî ve.

Hêvî li ser rûpelê şîn nebû.

21

Dayîkên Aştiyê

Ew polîseke sîvîl bû.

Her roj şemiyê wêneyekî dida destê xwe û wekî keseke

normal tevlî çalakiya dayîkên aştîyê dibû.

Serpêhatiyên kesên wînda êdî her hefte diket nava jiyana wê jî.

Ji mecbûrî ewê jî ji xwe re serpêhatîyeke kesekî wînda afirand û dema ku lazim dibû vedigot.

Bi vî awayî nêzîkî çar salan tevlî çalakiya dayîkan bû.

Ji serekên xwe re her hefte rapor jî nivîsand.

Lê rojekê tiştêk his kir: Gelekî bêriya dayîka xwe kiribû.

Ev bêrîkirin her roj mezin dibû û di laşê wê de dibû birîn.

Rabû li gelek xaniyên pîran ket dû şopa diya xwe.

Di xaniyeke pîran de diya xwe dît.

Hevûdu hembêz kirin.

Bi hev re hêsir rijandin.

Piştî vê yekê rabû dev ji polîstiya sîvîl berda.

22

Bi wêneyekî wînda ve vê carê jidil tevlî çalakiya dayîkên aştîyê bû.

Li kêleka wê polîsekî sîvîl bi wêneyekî wînda ve



rûniştibû.

Hevûdu nas kirin.

Ewê dizanibû ku wê ev polîsê sîvîl di derbarê wê de jî ji

serekên xwe re raporek binivîse.

Di dilê xwe de got, "Qet ne xem e!"

Dema ku li vê fikirî, ji xwe re keniya.

23

Pirtûk

Qet hez ji xwendina pirtûkan nedikir.

Di hemû jiyana xwe de tenê pirtûkek xwendibû.

Ew jî ew pirtûka ku wî bixwe nivîsandibû.

Jê tenê yek çap kiribû.

Lê piştî ku ew xwendibû, neecibandibû.

Dabû ber devê agirê sobe.

Barê xwe sivik kiribû.

24

Pêlava birîndar

Dema ku polîsan xalê min girtin, bi henekî wiha jê

pirsîn, "Em pêlavên te yekoyek ji serê çiyê top dikin, tu

çima xwedî li pêlavên xwe dernakevî, şev ji nigê te

derdikevin û her yek dikeve nigê terorîstekî..."

Ji bo ku her kes bitirse, deh pêlavên wî yên ku ji serê çiyê

top kiribûn li gundiyan belav kirin û cendekê wî avêtin

ser sergoya gund.

Ji tirsê kesê li cendekê wî jî nepirsî.

Dû re hate bîra min...

Ez hingê zarok bûm.

Xalê min bi pêlaveke xwe ya nû ve ji mal derketibû û bi

pêlaveke peritî ve vegeriyabû.

Wê şevê jinxala min pê re şer kiribû, "Tu yê serê me bixî belayê heyran, heke sibe kesek vê qulelê di serê pêlavê de bibîne, wê sedîsed fêm bike ku guleyek lê ketiye..."  
Xwedê zane ku yekî ew pêlava ku gulê lê ketibû dîtibû û paşê giliyê xalê min kiribû.

25

Wê zivistanê her kesî bi tirs behsa pêlavên xalê min kirin.

Pêlavên birîndar ên xalê min dû re ketin nav xewnên min jî.

26

Rihê Şer

Piştî ku şer qediya, êdî dixwest çîroka şerê xwe binivîse.

Dest pê kir...

Çend rûpel jî reş kirin.

Lê dît ku di nivîsandina çîrokê de jî şerekî dikir.

Te digot qey riheke nepen ketibû pênûsê.

Rabû dev jê berda.

Ji şer westiyabû.

Nedixwest ku êdî bi tu awayî şer bike.

Di nivîsandinê de jî.

27

Molotofkokteyl

Pismamê min yê nivîskar gelekî hez ji çêr û nifiran dikir.

Heke te çêr û nifirek jê bikira kêf dikir, zewq jê distanda.

Ji xwe ji ber vê yekê rabû dest bi amadekirina antolojiya çêr û nifirên kurdî kir.

Çiqas çêr û nifirek seh bikira, an jî bixwenda wê ew li ser  
kaxizeke biçûk binivîsanda; bixista şûşeyekê û devê wê  
bigirta.

Lê rojekê bi cîranê xwe re pev çû.

Pismamê min vê carê tehemûlî çêreke cîranê xwe  
nekiribû.

Ser û bêvila wî di xwînê de hiştibû.

Berê xwe dabû malê.

Ew şûşeya çêr û nifiran te jî benzîn kiribû.

Û pê mala cîranê xwe şewitandibû.

Berî du rojan ji girtîgehê derket.

Min hez dikir ku jê bipirsiyam ka ew çêra ku cîranê wî jê  
kiribû çi bû ku ew çend pê aciz bûbû.

Lê ji tirsê min nekarî.

28

Lal

Dîsa di eynî wê keştiyê de û dîsa di eynî wê saetê de em  
li rastî hev hatin.

Te digot qey, ew keştî bûbû cihê hevdîtina me...

Carna ez li hemberê wê rudiniştim, carna ew li kêleka  
min...

Lê qet nebe gotinek jî ji devê me dernediket.

Dîsa çavên me digihîştin hev û dîsa dilê me dibû yek.

Di ber rûpelên pirtûka xwe re, min dîsa li wan çavên  
xweşik dinêrî.

Û ewê jî bi wan keziyên xemrevîn ve, dîsa li min dinêrî.

Gelek caran min rûpelên pirtûka xwe bêyî ku bixwînim  
jî diqulipand.

Dîsa rojêke welê, di wê keştiyê de, li wî quncikî runiştibûm.

Min pirtûka xwe derxistibû û bi çar çavan mabûm li benda wê.

Bîsteke din, bi cil û bergên xwe yên lihevhatî û bi wê rûkeniya xwe ve hat û dîsa li hemberî min runişt.

29

Lê vê carê, piştî ku di bin çavê xwe re li min nihêrî, ji çenteyê xwe pirtûkek derxist û dest bi xwendinê kir.

Piştî kêliyêk din, xwe ranegirt dîsa berê xwe da min.

A hingê, min berga pirtûka wê dît...

Gava ku min navê pirtûka di destê wê de xwend, ez şaş û metel mam: Navê pirtûka wê, eynî ji ya ku min dixwend bû...

Çawa ku dilê min ketibe nava pirtûka wê, êdî min carek li destê wê dinêrî carek jî li lêvên ku dixwendin...

Dema ku em ji keştiyê derketin, ez nêzî wê bûm û bi heft kotek û bela, min jê re got: “Ez bawer im, ew pirtûk li xweşê we çû, an...?”

Em hêdî hêdî dimeşiyên, bayekî honik li ruyê min dida.

Hinekî bişirî û bi maneya “Erê”, serê xwe du caran li ser hev hejand.

Ew bişirîn û ew hejandina serê wê, heyecana min zêdetir kiribû...

“Kêfa we ji mijara pirtûkê re hat, an na..?” Ji bo ku xeberdana min qut nebe, min dîsa jê pirsî.

Dîsa bişirî... Serê her pênc tilîkên xwe gihand hev, hinekî hilda jor û dîsa hejand. Yanî: “Gelek...”

Min hêvî dikir ku, ew jî pirsekî ji min bike, lê qenî gotinek jî ji devê wê derneket. Piştî ku min du pirsên din jî jê kir, dîsa pê îşaret û mîmîkên xwe bersivand.

30

Gelo ew ji ber çî nedipeyîvî? Sed pirs di hişê min de diçûn û dihatin.

Min digot qey, wekî ku carna dihat li serê min jî, wê jî cesaret nedikir ku bipeyîve...

An jî çî bêjim, belkî jî, min pirsên beredayî jê dikir...

Min dîsa xwe negirt: "Welê dixwiyê ku hûn zêde hez ji xeberdanê nakin..."

Çawa ku bixwaze tiştêkî bibêje ji nişka ve sekinî.

Ez ketim meraqê, ka wê çî bibêje. Ez vekişandim ber keviya dîwareke xirbe. Rengê wê hinekî sor bûbû...

Weke keseke têkçûyî li nava bîbokên min nihêrî. Bi dest û tilîkên xwe, hal û meseleya xwe ji min re got...

Axxx çavê min birijê... Ew keseke lal bû.

Berî ku ji min veqete, li ser kaxizekî spî çend gotin nivîsandin, xiste nava destê min û kete ser riya xwe.

Min jî bi heyecan tiştê ku nivîsandî xwend, "Lehengê pirtûkê xayîntiyê li evîndara xwe kir..."

Tenê ev di hişê min de diçû û dihat: Xwezî, ez jî lal bûyam...

31

Polîsê Sîvîl

Cîranê me bû.

Em bi hev re mezin bûn.

Bi salan ji ber polîsên sîvîl reviya.

Bi tirsâ wan re mezin bû.

Ne tenê di binçav de, lê di xewnan de jî her tişt anîn serê wî.

Lê niha her kes ji ber wî direve.

Ez jî...

Ji ber ku ew êdî polîsekî sîvîl e!

32

Pêşbazî

Bi fikrê xwe yê herî baş ve tevî pêşbaziya 'fikrên herî baş' bû.

Bi ser neket.

Lê camêr dev jê neqeriya.

Bi wê fikra xwe ve heft salan bi ser hev tevî wê pêşbaziye bû.

Lê dîsa jî bi ser neket.

Êdî ji xwe re kiribû adetek.

Sala heştan bi heman fikrê dîsa tevî heman pêşbaziye bû.

Wê salê jûriyên pêşbaziye guherîbûn.

Fikra camêr, sala heştan bi ser ketibû.

Fikra wî bûbû yekem.

Niha ew bi wê fikra xwe dijî û pê debara xwe dike.

33

Xew

Jê kêfxweştir tu evdê Xwedê tunebû.

Êdî dixwest xewna xwe pêk bîne.

Xwest ku ji xewê rabe.

Hewlek da xwe.

Du hewl dan xwe..

Sê hewl...

Lê mixabin nedikarî ji xewê hişyar bibe.

34

Kusî

Robîn, hevalê min yê zarokatiyê bû.

Wekî şervanekî jîr 22 salên xwe yên herî delal li serê çiyê derbas kiribû.

Piştî ku şer qediya li gundê dêbavê xwe bicîûwar bûbû.

Berî heşt mehan ez çûm serdana wî.

Ji serê çiyê bi xwe re kusîyek anîbû.

Piyekî kusî birîndar bûbû û bi delalî hatibû pêçan.

Ji me bêtir her dem bala wî li ser kusiyê wî bû.

Min dêna xwe dayê gelek caran te digot qey bi kusiyê xwe re dipeyîviya.

Di derbarê kusî de min çend pirs jê kirin, lê bersiveke zelal neda.

Dema ku em vegeriyan, bavê wî ji me re wiha got, "Ew kusî hevalê wî yê herî baş e, gelek hevalên wî serê xwe dan haziran, lê ew kusî ji piyekî xwe bi guleyekê birîndar bûbû û ji şer sax filitîbû, li serê çiyê 15 salan di sir û seqem û şilî û piliyê de bi hev re mane..."

Ez nizamim ji ber çî lê dilê min bijiya hevaltiya wî kusiyê.

35

Neynik

Wekî her roj ji xew şiyar bû.

Serûçavên xwe şûşt.

Xwest ku di neynikê de li xwe binihêre.

Lê xwe tê de nedît.

Pir aciz bû.

Kulmek li neynikê da.

Neynik şkest, hûr hûr bû.

Destê wî birîndar bû, xwîn jê herikî.

36

Nexweşiya Pêlavan

Doh şeveqê ez bi xirecira karkerên şaredariyê hişyar  
bûm.

Giliyê cîrana me kiribûn, bêhn ji xaniyê wê dihat.

Karkerên şaredariyê qamyonek pêlavên kevin ji odeyeka  
wê derxistibûn û bi xwe re biribûn.

Kesî cîrana me nas nedikir.

Bi tena serê xwe dijiya.

Carna hin kesên nenas dihatin serdana wê.

Ya rastî ew şervaneke kevin bû.

Li gorî hin gotinan piştî ku şer qediya aqilê xwe xwar,  
dîn bû.

Gelek caran dema ku ewê ez didîtim, bi bahaneyekê ve  
gotinê dibir ser nigên xwe û digot, ev nigên min gelek  
berf û qeşa ditiye.

Vêca hema çend qurûşên wê hebûyan wê ji xwe re bida  
pêlavekê, an jî wê li ser sergoyan pêlav ji xwe re berhev  
bikiran.

37

Ez nizamim bi çi rengî, lê min jê re got ku tu bi  
nexweşiya pêlavan ketî.



Gelekî aciz bû, rabû bi pêlava xwe ve da dû min.

38

Serok

Bêlome be!

Wekî wî min qet nedîtin.

Gelek hez dikir ku bibûya serokek.

Di her firsendê de vê yekê digot jî.

Ji ber vê yekê hema bêje di nava hevalan de xwe rezîl jî kiribû.

Di dawiyê de gihîşt armanca xwe.

Bû serokek.

Lê roja ewil ji serokatiyê îstîfa kir.

Çima?

Ji kesî re negot.

Hezar carî bêlome be!

39

Pênûs û Lênûsk

Ji cejnê re hê hefteyek mabû...

Lê bêhna wê li çarnikarê gund belav bûbû...

Haziriyên cejnê ji zû ve dest pê kiribûn...

Gîska şêrînok hatibû kifşkirin...

Tifika malê hatibû paqîşkirin...

Diya min, kinc mincên qirêj biribûn ber kaniyê...

Bavo jî berê xwe dabû bajêr...

Dema ku ji bajêr vegeriya, bi şalê xwe yê pînekirî ve çûbûm pêşiyê...

Lê tiştêk ji min re nehanîbû, ji xeynî lênûsk û pênûsekê...

Ji kerba, wê şevê bi têra dilê xwe giriyam...

“Min kincên nipûnî divên...!”

Şeveqa cejnê, zilamên gund berê xwe dan mizgeftê...

Melayê gund, wê şeveqê di minara wê mizgeftê de

terqîna zilamekî xwend...

40

Ew zilam, bavê min bû...

Piştî hingê min ji xwe re got, rihê bavê min êdî kete vê

pênûs û lînûskê...

Ji wê rojê û pê de, çiqas ku cejneke tê, hêsirên ziwa

dibarin ser pênûs û lînûska min...

41

Jibîrker

Min ew li girtîgehê nas kir.

Kesekî wisa bû ku her tiştî ji bîr dikir.

Ji ber vê nexweşiya xwe bi saetan di tiwaletê de dima.

Ji xwe ji ber vê yekê jî hatibû girtin.

Dema ku molotof avêtibûn ji bîr kiribû ku agir berdiyê.

Çaxê hate binçavkirin ji bîr kiribû ku wê rastiye nebêje.

Heft salan di girtîgehê de ma.

Wê sibe ji girtîgehê derketa.

Lê tê de ma.

Camêr ji bîr kir ku ji girtîgehê derkeve.

42

Gez

Ji zû ve bû ku lawik dixwest wê maçî bike.

Lêvên wê her dem diketin nava xeyalên wî.

Lêbelê ji bo vê yekê cesaret nedikir û nedikarî dilê xwe jê

re veke.

Keçik jî eynî wisa bû.

Lê rojekê keçikê êdî îdare nekir û jê re got, "Heke tu aciz nebî, ez dixwazim te maçî bikim!"

Lawik lal bû, nekarî tişteki bibêje.

Bi maneya "erê", serê xwe hejand.

Keçikê ew gez kir.

Da ber gezan.

43

Randevû

Her şev bi lawîkekî cihê re randevûya wê hebû.

Roja duşemê bi Diljen re...

Roja sêşemê bi Dilnas re...

Roja çarşemê bi Dilgeş re...

Roja pêncşemê bi Diljîn re...

Roja îne bi Dilbêj re...

Roja şemiyê bi Dilxweş re...

Roja yekşemê jî bi Dilçem re...

Serê pêşîn dilxweş jî bû ku her şev bi lawîkekî re dide û distîne.

Lê piştî demeke din tenê dixwest bi Dilçem re bide û bistîne.

Lê kir û nekir yê din qîma xwe pê nehanîn.

Ewê jî nekarî tu kesî qane bike.

Rabû bi Dilçem re çû hemû randevûyên din.

44

Serdest û Bindest

Ew her roj di ber şibaka me re derbas dibûya.

Dema bindest bû qet bîrê nedibir ku wê rojekê bibe

serdest.

Çaxê bû serdest qet lê nefikirî ku wê dîsa bibe bindest.

45

Ken û Girîn

Di şer de ken û girînê ji bîr kiribû.

Piştî ku şer qediya, dixwest ku êdî bi têra dilê xwe bigirî  
û bikene.

Pêşî serî li terapîstê kenînê da.

Terapîstê kenînê jê re wiha got, "Divê tu pêşî bikaribî  
bigirî, da ku tu bikaribî bikenî..."

Lewma ji wir derket, berê xwe da terapîstê girînê.

Terapîstê girînê wiha jê re got, "Divê tu pêşî bikaribî  
bikenî, da ku tu bikaribî bigirî..."

Bi çavê zoq li terapîst mêze kir.

Ne dizanibû wê bigirî an jî bikene.

46

Çavê Çepê

Di şer de çavê xwe yê çepê winda kir.

Şer qediya.

Bi çavê xwe yê rastê ve fêrî şewekariyê bû.

Û wêneyê çavê xwe yê çepê neqîşand.

Bi çavê xwe yê rastê ve lê nihêrî.

Di wêneyê de çavê xwe yê çepê didîta.

Xweziya xwe pê hanî ku çavê wî her dem wisa bidîta.

Hêsir ji çavê wî yê çepê bariya.

47

Xayîn û Leheng

Rojekê Xayîn û Leheng hatin cem hev.

Maskeya ser rûyê xwe derxistin û ji hev pirsîn.

"Pismamê Xayîn, tu çi tiştê min diecibînî?"

"Ez xayîntiya te diecibînim pismam. Gelo tu çi tiştê min diecibînî?"

"Bi serê te ez jî lehengtiya te diecibînim pismam..."

Lê kesî ji wan negot, "Çima?"

Ji hevûdu re bişirîn.

Piştî ku maskeya xwe pev guherandin, dan ser rûyê xwe û ji wir veqetiyan.

48

Rêveçûn

Piştî ku şer qediya, dixwest her tiştê xwe biguherîne.

Wisa jî kir...

Navê xwe, şeklê porê xwe, retorîka axaftina xwe, bi emeliyatê şeklê rûyê xwe...

Welhasil her tiştê xwe guherand.

Rojekê li ser peravên Barcelonayê li ser qûmê ji xwe re dimeşiya.

Lê kevnehevalekî wî ew li wir nas kir.

Pêşî dixwest jê bireve, lê mereq kir bê çawa ew naskiriye.

"Tu dizanî rêveçûneke te ya taybet heye..." jê re got,

"Weke ku nigê te bixwazin ji ber te ve tişteki vebêjin lê nikaribin, bi vî awayî bi rê ve diçin, berî 14 salan jî her wisa bûn..."

49

Sorav

Em jî nizanin bê êdî em ê çi bikin.

Keça me Berfîn hêdî hêdî mezin dibe, helbet daxwazên wê jî.

Wê rojê ji diya xwe soravê dixwaze bo ku li neynokên nigê xwe bide.

Lê em her dem vê daxwaza wê bi bahneyekê ve piştguh dikin.

Ya rastî em naxwazin ku keça me ya din Şevgul bi sorava Berfînê ve her dem li nigê xwe yê ku li mayînekê qelibibû bifikire û her dem biqehire.

Em jî nizanin bê êdî em ê çi bikin.

Li milekê sorava Berfînê, li milê din jî nigê Şevgulê...

50

Wîjdan

Her sal ji ewropayê dihat û berê xwe dida gundê xwe.

Baqek gul datanî ser tirba dêbavê xwe.

Lê tu carî ji bîr nedikir, baqek gul datanî ser tirba cîranê xwe yê ermenî jî.

Bi vî awayî gohê xwe dida dengê wîjdana xwe û pê rehet dibû.

Gelek caran li ser tirba ermenî dua jî dikir.

Te digot qey dixwest gunehên xwe bide efûkirin.

Lê par dema ku dîsa hat dît ku tirba cîranê wî yê ermenî ne li cihê xwe bû.

Li gora gundiyan, merivên tirba ermenî hatibûn û tirbê biribûn welatekê din.

Lê ewî ji tu kesî bawer nekir.

Êdî hew hat gund û serdana tirba dêbavê xwe jî nekir.

Camêr êdî li bajarê xwe serdana tirbeke ermenî dikir û

baqek gul datanî ser.

Bi dengeke bilind dua jî dikirin.

51

Bi vî awayî gohê xwe dida dengê wîjdana xwe û pê rehet dibû.

52

Pêlîstok

Birayê min di şer de pora xwe spî kir.

Li serê çiyê tenê bêriya du tiştan dikir.

Yek; azadî.

Du; pêlîstokên zarokatiya xwe.

Dema ku şer qediya gihîşt azadiya xwe an na, ez nizamim.

Lê dema ku vegeriya malê pêlîstokên zarokatiya xwe jî nedît.

Lewma gelekî giriya.

Dîn û har bû...

Dîsa derket serê çiyê.

Êdî nema vegeriya.

Em li rastî dewseke wî jî nehatin.

Carina hin gundiyan derdor di nava xwe de gotegot dikirin ku li serê çiyê li rastî hin pêlîstokên ecêb hatine ku ji dar û tiştên kevin hatine çêkirin.

Lê binyata van gotegotan çi bû heta niha jî em nizanin.

53

Evîn

Leşkeran berî bîst rojan bavê min ji firokê avêtin meydana gund.

Bi vî awayî dixwestin hemû gundiyan çavtirsandî bikin  
da ku tu kes yarmetiya şervanan neke.

Pepûka diya min bi destê xwe cendekê bavê min şûşt û  
veşûşt.

Dema ku me ew xist bin axa sar, diayên xwe yên herî  
spehî wekî kulîlkên ji dilê xwe lê barand.

Ji wê rojê û pê ve, ev nozdeh roj e diya min weke  
keçikeke hijdeh salî ji ber neynikê ranabe.

Soravên herî delal li xwe dide; wekî çivîka çardehê  
nîsanê hermetê di ber re carna stranan jî dibêje.

Yê ku nizanibe, dê sedîsed bibêje qey diya min dil  
berdaye yekî.

Ma ez ê çî derewan bikim; min xwe negirt û jê pirsî.

Bi henekî got, “Xwezîîî...”

Lê dû re barê xemgîniyeke veşartî ketin ser rûyê gotinên  
wê:

54

“Berî sî û heşt salan dema ku min dil berdabû bavê te ez  
dîsa dihatim ber vê neynikê û wekî niha min xwe ji bo  
wî xweşik û delal dikir. Lê nenêre ku ez niha hewl didim  
dîsa bistrêm, hingê kurê min... hingê stranên herî  
xweşik diketan ser lêvên min. Lê va ye ev nozdeh roj e,  
strana dilê min mir û ket bin vê axa sar. Ez dizanim  
beredayî ye, ez dizanim ev qedera reş neynika xwe dide  
rûyê me gişan... lê.. –diya min di vir de, destê xwe weke  
ku bi ser guliyên bavê min de bîne, bi delalî bi ser  
neynikê de dibe û tîne...- lê li ber vê neynikê ez wan  
rojên xwe dîsa dixwazim şîn bikim. Ez dibêjim qey ev



neynik jî, ji wan rojên evîndariya me çend dîmenên  
nemir tîne û diyariyê min dike.... Xwezî ev neynik  
bikariya bavê te jinûve sax jî bikira... Axxx... ezîzê min  
dev ji min berde. Ma nexwe ez ê çawa bikim kurê min, bi  
vî awayî ez dikarim hinekî berîkirina dilê xwe honik  
bikim... axxxx... min ji wan leşkeran re got, min jî bi wî  
re bibin, lê pehînek li min xistin...”

55

Masî

Di şer de her dem masî diketin xewna wî.  
Bi şer re radiket û bi masiyan ve ji xewê radibû.  
Masî, serhişkî û dîktatoriya wî piçekî jî nerm kiribûn.  
Dema ku şer qediya, her dixwest ku di binê behrê de bi  
hezaran bi mîlyonan masiyan re avjenî bike.  
Wisa jî kir.  
Xwe fêrî avjeniya bin avê kir.  
Di binê gelek behrên bê binî de hevaltiya masiyên  
rengereng û curbecur kir.  
Di nava rengînê û balkêşiya masiyan de te digot qey ji nû  
ve dihat dinyayê.  
Êdî nekarî bêyî wan bijiya.  
Di binê behrê de ji xwe re xaniyek ava kir.  
Lê li ser behrê û li ser erdê jî ji bo parastina masiyan  
têkoşiya.  
Ji bo vê yekê bû têkoşerekî mezin.  
Bi dîktatoriya xwe ya şer de ewqas deng nedabû.

56

Heval

Her çar jî hevalên hev ên herî baş bûn.  
Piştî 26 salan dema ku şer qediya li qehwexaneyê dîsa  
hatin cem hev.  
Ne hindik e, 26 sal...  
Rohat ji Ewropayê hatibû.  
Robîn ji serê çiyê.  
Ronas jî ji girtîgehê.  
Lê Rojhilat nekarî ji gora xwe derkeve û were.  
Ewî di bin wê axa sar da bêriya hevaltîya wan dikir.  
Rohat, Robîn û Ronas çûn serdana Rojhilat.  
Baqek gul danîn ser gora hevalê xwe.  
Weke ku perasûyê piştî wan kêmbê, destê xwe bi ser  
axa sar de hanîn.  
Hêsir rijandin ser axa sar.  
Dixwestin ku Rojhilat dîsa biveje.

57

Îtalî

Dema ku me hevûdu nas kir, min jê re got ku ez Îtalî me.  
Ditirsiyam ku heke min jê re bigota ez kurd im, belkî jî li  
şûna seksê me yê heta şevqê behsa meseleyên siyasî  
yên kurdan bikira.  
Piştî ku wê şevê me dilê xwe bi hevûdu rehet kir, ez  
nizanim çawa, lê pê derxist ku ez kurd im.  
Li gorî gotina wê, di xewn de ez qêriya me û min gotiye,  
"Îşkencê li min nekin, hewlo hawar, dev ji min berdin, ez  
bêguneh im..."  
Min nehişt ku gotina xwe temam bike û min xwe aciz  
kir, "Ma gelo yekî îtalî jî nikare xewnên wisa tirs û xof û

erjeng bibîne..."

Nehîşt ku ez gotina xwe temam bikim, "Derewan neke dîno, mêrê min yê kevin jî kurd bû û gelek caran di xewn de hinekan îşkence lê fikir û wekî te diqêriya..."

58

Çarşem

Her roja çarşemê dema ku saet bibûya 11.00, wê ji xwe re qehweyek çêkira, li ser şaneşînê piyê xwe bavêta ser hev û wê çarîkekê li wê kêliya ku dîsa li jiyane vegeyriyabû bifikiriya.

Di şereke giran de birîndar bûbû.

Gelek hevalên wî li ber serê wî miribûn.

Ewî jî hêdî hêdî haziriya ezraîlê xwe fikir.

Lê dema ku dîtibû leşker ber bi wî ve hildikişin, weke ku di nava xewnekê de be, bi laşê xwe yê giran ve, bi çelepelî xwe xirikandibû û di nava deviyekê de veşartibû.

Heke leşkeran sê çar cendekê hevalên wî li wir nedîtana, belkî yekoyek li wan deviyên jî bigeriyana û bidana dû şopa wî.

Leşkeran rahiştibûn wan cendekan û ji wir çûbûn.

Piştî du rojên din, roja çarşemê di saet 11.00'an de (dû re ji hevalê xwe fêr bûbû!) hevalên wî bi hawara wî de hatibûn û ew ji ezraîl rizgar kiribûn.

59

Gule

Min ew li wê Salsa-Bara navdar ya li Berlînê dît.

Bi rûyê xwe yê xemgîn ve hewl dida ku bida dû wê

strana narîn ya bi spanî.  
Min jî bi spanî silav dayê.  
Di ber danskirina salsayê de me hevûdu hinekî nas kir.  
Piçekî jî te digot qey dikuliya.  
Ji min re got ku ew ji welatê Perûyê hatiye û li Berlînê  
doktoraya xwe dike.  
Ji min çêtir spanî dizanibû.  
Ez nizanim çawa çêbû, lê dema ku me li ser şoreşgertiya  
dinyayê nîqaş kir di derekê de aciz bû.  
Di ber axaftineke xwe ya spanî de bi kurdî got, "De here  
loooo!"  
Ez sar bûm, xwîna min cemîdî, min jê re got, "Ma qey tu  
kurdî jî dizanî?"  
Êdî nekarîbû xwe veşêre.  
"Ez jî wekî te kurd im" bi devlikenî ji min re got.  
60  
Dû re bi pirsan ez ketim dû çîroka wê.  
Şervaneke kevin bû.  
Ji hevlekî xwe yê ku ji Spanyayê tevlî gerîla bûbû, fêrî  
zimanê spanî û dansa salsayê bûbû.  
Lê ne tenê ew, gelek hevalên wê jî li serê çiyê fêrî zimanê  
spanî û dansa salsayê bûbûn.  
Li gorî gotina wê, gelek hevalên wê ji ber zimanê spanî ji  
şer sax filitîbûn.  
Ji ber ku di bêtêlan de bi hev re bi spanî dipeyîviyan.  
Û ev jî dikir ku leşkeran nikarîbûn bi rehetî li wan  
guhdarî bikirana û bidana dû şopa wan.  
Dema ku şer qediyabû, xwe noqî nav dans û mûzîka

salsayê kiribû.

Bi vî awayî rihê xwe yê birîndar tedawî dikir.

Min jê pirsî, "Ji şer çi ji te re ma?"

Got, "Dansa salsa û guleya di nigê min de"

61

Dikana Zargotina Kurdî

Li serê sûka Sêrtê ji xwe re dikanek vekir.

Navek jî lê kir, "Dikana Zargotina Kurdî"

Pêşî kesî tiştek jê fêm nekir.

Bi bêhnfirehî ji hemû mereqdarên re behsa kar û armanca xwe kir.

Wê serê her stran, klam, dûrik, biwêj, gotinên pêşiyên, metelok, çîrok, çîrçîrok, destan, pêkenok, heyranok, payîzok, meselok û hwd. çend qurîş jî bida.

Lê kesî jê bawer nekir.

Gotegot û fesadiyên derdor hatin heta ber gohê wî jî, "Sîxur e, zîlamê dewletê ye, CIA li piştê ye, kurdekî xwefiroş e..."

Lê ewî gohê xwe neda tu kesî.

Şevê lawîkekî 14 salî ji dêbavê xwe çend gotinên pêşiyên gohdarî kir, bi kurdiyêke xirab ve nivîsand û anî firot xwediyê Dikana Zargotina Kurdî.

Bi çend qurîşan ve ji xwe re şêranî, pênûs û defterek jî stand.

62

Bi vî rengî hevalên wî jî dan dû şopa lawik.

Roj bi roj berhevkarên zargotina kurdî li ber dikana wî ketin dorê.

Xwediyê Dikana Zargotina Kurdî her şev van zargotinên kurdî sererast dikir, serê her mehê jî dibir Amedê û difirost sazî, dezgeh, enstîtû, weşanxane, stranbêj, radyo û televîzyonên kurdî.

Ew ji karê xwe memnûn bû.

Camêr bi vî awayî debara xwe dikir.

63

Koziya Şer

Birek leşker û gerîla di koziyên cihê de xwe ji şerekî nû re amade dikirin.

Lê haya wan jê tunebû.

Ev deh roj bû ku şer qediya bû.

64

Neheqî

Nigê xwe yê çepê berî yanzdeh salan kiribû qurbana mayînekê.

Ji hingê ve her difikirî ku neheqiyê li nigê xwe yê rastê dike.

Gelek caran wekî hevalekî bi nigê xwe yê rastê re sohbet dikir, "Hevalo li min negire, bi rastî ez dizanim ku gelek neheqiyê li te dikim, tu bi tena serê xwe barê min hildigirî û min dibî her derê, gelek caran wîjdana min jî tehemûl nake, lê ez ê çareyekê bibînim, soz..."

Dixwest ji nigê xwe yê çepê re nîgekî protez çêke.

Lê ev tu carî ne hêsan û ne jî mimkûn bû.

Rabû nigê xwe yê rastê jê kir.

Xwe ji vê neheqiyê rizgar kir.

Êdî her du piyên wî bûbûn wekî hev.

65

Fikir

Camêr li her derî pesnê xwe dida û wiha digot, "Niha tu kes qîmeta fikrên min nizane, lê piştî 40 salên din wê fikrên min li her derî şîn bibin..."

Rabû bi hevalên xwe re çend fikrên xwe yê bi jare kir şûşeyekê û devê wê girt.

Piştî 40 salên din dema ku şer qediya camêrê me bi hevalekî xwe re devê şûşê vekir.

Dît ku fikrên wî riziyan, bêhn jê tên.

Ji bêhna genî nema îdare kir.

Hema di cih de devê şûşê girt.

Mad û mirûzê xwe tirş kir û bi ser hevalê xwe de qêriya, "Ev ne fikrên min in. Sedîsed hin kesan bi renekî fikrên min guhertine!"

Ji devê wî çend çêr jî derketin.

Hevalê wî lê keniya.

66

Periya Reş

Ev bû çend roj in ku min ji keça min Berçemê re kursiyek a biteker kirî.

Bi vê kursiya xwe ya biteker ve hingê kêfxweş e ku tu dibêjî qey heft piyên nû pê ve çêbûne.

(Haaaa, biborin min ji bîr kir, berî salekê keça min Berçemê ligel diya xwe pêlî mayînekê kir, diya wê û her du piyên wê yê delal bûn qurbana wê mayînekê...)

Lê mixabin ligel vê kêfxweşiya xwe ya bi kursiya xwe jî, nikare xwe ji xewnên xirab bişû.

Doh berê şeveqê, bi du hêsirên xwe yên bêxwedî ve (axxxx, çavê min birijê...) xewna xwe ji min re vegot: "Bavooo, ez nizam ez ê ji te re çawa vebêjim, baş nayê bîra min, lê te digot qey yekî min ber bi mayînê ve dehf dida, çi ecêb bû ku hemû periyan jî vê yekê didîtin, lê xwe tev nedidan, te digot qey xwe li kerr û kor û lalitiya datanîn. Lê ji nişka ve periyêke ku çermê rûyê wê reş bû min dît ku bi çelepelî xwe bi erdê re dixirikand û ber bi min ve dihat. Ez nizanim çawa, lê min tê derxist ku ew diya min bû. Bi lez dikir û dixwest ku min ji wê mayînê biparêsta. Her du piyên diya min jî tunebûn, lê dixwest ku destê xwe bixe bin piyê min da ku ez pêlî wê mayînê nekim. Hêsirên spî ji çermê rûyê diya min ya reş dadiherikin. Hingê wekî baraneke reş hêsir ji çavê min jî rijyan. Axxx bavooo, min pirr bêriya diya xwe kiriye..." Hêsirên min jî dadiherikin ser dilê min...

67

Bîtlîs

Li ser pira navdar ya Pragê ez li rastî wî hatim.

Wêneyên xweşik ên jan û xemgîniyê çêdikir û difiroto turîstan.

Ya rastî serê pêşî min nedizanî ku ew kurd e.

Lê min di tabloyêke wî de dît ku di nava gundekî şewitî û kabilbûyî de pakêteke cixarê ya bi navê 'Bîtlîs' jî neqîşandibû.

Piştî vê yekê min bi kurdî silav dayê, "Rojbaş Keko..."

"Weyyy rojbaş û ser çavan. Te çawa dizanî ku ez kurd im..."



"Ji cixara Bîlîsê ya ku te di tabloyê xwe de neqîşandiye.  
Xuya ye ku te jî pir cixara Bîtlîsê kîşandiye..."

"Na bi Xwedê min heta niha jî qet cixare neqîşandiye, lê  
leşkeran bi tozeke zer û bi agirê wê cixara Bîtlîsê gundê  
min şewitandin..."

68

Keleşkof

Ew li Sêrtê hostayê keleşkofan bû.

Êdî zarokan jî seh kiribû ku ew keleşên xirabeyî yên  
şervanan çêdikir.

Şevêkê sê polîsên sîvîl kincên şervanan li xwe kiribûn û  
li deriyê mala wî xistin.

Wekî şervanan silav danê, bi hev re çaya qaçax  
vexwarin.

Keleşeke xirabûyî pê dan çêkirin.

Camêr dîsa pir kêfxweş bûbû.

Lê nedizanîbû ku ew polîsên sîvîl bûn.

Sê rojên din bi guleyeke wê keleşê ve hate kuştin.

Gotina ku herî dawî ji polîsên sîvîl seh kiribû ev bû, "Tu  
hostayekî baş î!"

69

Naverok

Qelûn 7

Bawerî 8

Girtîgeh 9

Tirs 12

Koleksiyona Pêlavên Leşkeran 13

Nivîskar 14

Panzer 16  
Pêkenokên Şer 17  
Qêrîn 18  
Bêrîkirina Welêt 19  
Hêvî 20  
Dayîkên Aştiyê 21  
Pirtûk 23  
Pêlava Birîndar 24  
Rihê Şer 26  
Molotofkokteyl 27  
Lal 28  
Polîsê Sîvîl 31  
Pêşbazî 32  
Xew 33  
Kusî 34  
Neynik 35  
Nexweşiya Pêlavan 36  
Serok 38  
Pênûs û Lênûsk 39  
Jibîrker 41  
Gez 42  
Rendevû 43  
Serdest û Bindest 44  
Ken û Girîn 45  
Çavê Çepê 46  
70  
Xayîn û Leheng 47  
Rêveçûn 48

Sorav 49  
Wîjdan 50  
Pêlîstok 52  
Evîn 53  
Masî 55  
Heval 56  
Îtalî 57  
Çarşem 58  
Gule 59  
Dikana Zargotina Kurdî 61  
Koziya Şer 63  
Neheqî 64  
Fikir 65  
Periya Reş 66  
Bîtlîs 67  
Keleşkof 68  
71

72

Pêlava Birîndar

Dema ku polîsan xalê min girtin, bi henekî  
wiha jê pirsîn, „Em pêlavên te yekoyek ji serê  
çiyê top dikin, tu çima xwedî li pêlavên xwe  
dernakevî, şev ji nigê te derdikevin û her yek  
dikeve nigê terorîstekî...”

Ji bo ku her kes bitirse, deh pêlavên wî li  
gundiyan belav kirin û cendekê wî avêtin ser  
sergoya gund.

Ji tirsî kesî li cendekê wî jî nepirsî.  
Dû re hate bîra min...  
Ez hingê zarok bûm.  
Xalê min bi pêlaveke xwe ya nû ve ji mal derketibû  
û bi pêlaveke peritî ve vegeyabû.  
Wê şevê jinxala min pê re şer kiribû, „Tu yê  
serê me bixî belayê heyran, heke sibe kesek vê  
qulelê di serê pêlavê de bibîne, wê sedîsed fêm  
bike ku guleyek lê ketiye...”  
Wê zivistanê her kesî bi tirs behsa pêlavên xalê  
min kirin.  
Pêlavên birîndar ên xalê min dû re ketin nav  
xewnên min jî.  
HAN Çîrok  
HAN Çîrok Evdile Koçer Pêlava birîndar  
Evdile Koçer  
Pêlava birîndar  
ISBN 978-3-940997-01-2  
\*\*

## PEXŞANNAME

www.tirej.info www.tirej.name  
Çîrok, Kurteçîrok, Novel  
P E X Ş A N N A M E  
B e ş a Y e k e m  
Ji 35 hejmarên  
Mehnameyê  
1 000 rûpel  
Pexşana Kurdî

Buharên wî

Mahmûdê Ako: ako@hawarkurd.de

Ji Ebderhmanê Afîfî û Ferhadê Ahmê re.

Bayê buharê yê hênik, bêhna erdê, tîrêjên rojê,  
vebûna gula, û dilê wî yê reben ku di tenêbûna xwe  
de her roj sed carî dimre. Buharên xelk û alemê tev  
de bi kêfûşahî, hezkirin û ramûsanên derbas dibin,  
yê wî, bi hisret, fîxan û kulan re derbasdibe, û  
dubhure. Blê dilê wî yê bi tenê derbasî kêleka vî  
bajarê bê dil , bê cerg û hinav dibe. Dilê wî tê  
sûtandin û henek jî pê tê kirin. Ew û dilê xwe yê  
reben, ku ji rebenîya xwe hew dikare hezbike, anjî  
bawerî yê bi hezkirinê bîne. Roj û şev li cem dilê wî  
weke hevin.

Erê bajarê bajarê ku te xwe daye kêleka nexweşên  
ezezîtî û pêkenînê, yên ku henekên xwe bi her awayî  
bi dilekî serş û xerîb dikin. Tu başbe an na, tu zanbe  
an na, belê ku tu xweda be jî, ew bawerî û hezkirina  
ji dil ku jibo te wekî mirov nyaê hebûnê. Cara yekê  
bû ku çavên wan li hev diketin. Qîza zinayê, awirin  
dijwar di nava wî de vedidan. Her nerînek wê belê  
ew dikir Melayekî Cezîrî, Feqayekî Teyran. Dilê wî  
yê belengazî û kurdûnde, evîn ji nêzkî ve, hîn  
nedîdibû, dilê wî û xewnên xortekî rojhilatê, bi  
payebûn di sîstema cîhanî ya nûjende digevizîn.  
Gelo ev nûhbûn nûhbûna çiye!!? Ev nûhbûna, ku  
cîhan tev de pê daketiye, zanîngêhen ezmanî, yên bê  
sînor û qûnax, ev cîhana ku bûye weke hêkekê, û

kesk ji tu kesî razî tune, kesk ji kesekî hezbike jibo kesîtiya wî tune, dibe ku hin peyda bibin, lê bêguman ew jî mîna wî ne Ew belengazê, ku xwe di xema xeynî xwe de, xwe winda kiriye. Û di xeşîmîyê de sobelanê dike.

Ew care yekê bû, ku wî bi destên jinekê digirt û bi dilbijîn wî dixwest ku dem hinekî bi pêşve herî û nasbike, ka ev mirov çawaye, bi çi dirame. Û razana pêre di nav nivînekê de ji wî re dibû xewnek pîrr xweş. Dilê wî, ew dehef dida û di dava wê de werkir. Erê dilê wî bû, yê ku mala wî li malên xerîb û segan gerand û dawî jî yê poşman û bê erz, bê namûs û be bext ew û dilê xwe bûn. Ew û dilê xwe yê xeşîm û nezan di vê sîstema cîhanî ya ku sînor ji nav nêr û mê hilanyî ye. Ya ku qeyd û zincîrên ,Isa, Mûsa, û Mohemed şikandine, û xwe di valahîya vê gerdûnê de digevizîne. Bi payebûna azadîyê û ya ezezîtiya bê sînor, evîn tê sêdarkirin. Windabûna dilê wî di vê çarçoveyê de, weke mirovî ku xwe tazî bibîne.

Karbidest

Mahmûdê Ako: [ako@hawarkurd.de](mailto:ako@hawarkurd.de)

Ez bi gavin sist bi derencê ve hilkişîm. Hetanî ku ez gihştîm qata sisiya devê min zuha bû. Derbasî oda ku zarokan lê qeyd dikin bûm. Min destê xwe dirêjî karbidest kir, bi tirs û sawê ez girtim. Min di nava xwe de got: " Dibe ku berra min de ji vir, yan jî bi ser min de rabe û erza min bişkî ne, hingî ezê çi ji

xwe re bêjim!?

- Ezbenî ji kerema xwe ....Ez dixwazim....

Yê karbidest rê neda min ku ez gotina xwe berdewam bikim. Wi bi devekî qefil û rûki şûştî berê xweda min.

- Xêre...Serê vê sibehê....

Bi madekî tal û tirş zerf ji destê min girt.

- Hi..hi! ku ne li vir be hun nayên zeftkirin. Zarokekî nû ji we re çêbûye. Başê, ev çiqasî wî qedya ku çêbûye. Çima tu bi derengî hatî ye wî li nifûsê qeyd biki hê....Hema bi xwedê hun tev de....Tu caran win tiştê ecele fêhmakin?.

Min di nava xwe de dixwest ku bersivin hişk jê re bêjim lê....Destê ku tu nikaribe bişkîne maçke û deyne ser serê xwe. Min bi hêdîka û bidilovanî jê re got:

- Bi rastî ezbenî, ev nebûye sêçar rojên wî ku çêbûye.

Wî nehişt ku berdewam bikim gotina min birrî û got:

- Bes bes..Ez bawerim ku ev bûye sê çar salên wî, anjî berkî ne lawê te be, lawê hin ji vanê 1ECNEBI yan be, ev lîskê wilo genî ji we Kurda tên ku hun bikin. divê tu wî bîne em lê binerin!?

Wî wilo got û agir ji çavan diçû. Min bi dilşadî û bi hêviya ku ecele îşê min biqedîne jêre got:

- Ezbenî ji kerema xwe îşê min hîna li devirin dî heye, û tu jî vê zanî, divê hîna ez herim ba Emen Edewlê û cihê temwînê jî lawik qeyd bikim.

Dema ku min wisan jê re got, beşîrî kenya, diranên wî yên zingarî weke mîxên di bin sergoyan de dixwiyan.

- Ka were virde lo.tu çi karî dikî, ji te xuya ye ku tu têre.

Min naskir bê daxwaza wî çiyê. Min jî êdî bi payebûn jê re got:

- Ez xwedî milkim, xwedê bide ometa Mohemed tevî, û bide tejî, çend çewal erdê min di xeta dehand de hene.

Dema ku dengê xeta deha hat guên wî, ew ji cihê xwe qevizî, beşîrî û ber min ve hat. Bi guh miçkî destên xwe dirêjî min kir.

- Rûne mamo....Kermeke rûne....Kiro Cabir....Wa Cabir! Ka qehwakê ji apê xwe re bîne. Ez zanim vê sibê tu hinekî ji min aciz bû ye. Kar geleke û ez jî bi tenê me. Navê te bi xêr?

Bi rastî êdî ez şabûm, û di wê kêlîkê de gotina dapîra min hat bîra min." Lao pere, pere iloçê zilama ne".

Ez li ser kursyê rûniştim û min nig danî ser nig. Wî ji pakêta xwe çixarek Ecnebî derxist û ji min re pêxist. Di wê kêlîkê de fincana qehwê jî digya. Cabir jî dev li ken bi kêf û şahî qehwe danî ber min û rawstyayî ma. Min fam kir bê daxwaza wî çiyê, min destê xwe avêt bêrkê xwe, lê yê karbidest bezî û madê xwe lê tirş kir.

- Na. Na ezbenî ev li ser me ye. Oxir be ji te re Cabir.



Min xwest ku bi lez ji wir derkevim, lê wî nedihîşt ez merama xwe bigihînim serî û pirsin kelovajî ji min dikirin.

- Çiqas erdê te heye....Înşele wê îsal mûsim baş be....Çend zarokê te hene...çi hesinê we heye. Û...Û??

Min di dilê xwe de digot" Gelo ma ev mirov dixwaze mervantîya min bike, yan ez li fireê Emn Edewlê me“.

Min hêz û qeweta xwe girt û min gotina wî birrî.

- Mamûsta ez dixwazim navê layê xwe li ba we qeyd bikim.

Wî bi dilnazî li min vegernd:

- Ê.. de ka bêj, tê navê wî bi ke çî. Ser xêrê be încele. Ka tê çî bidî me, hema çî ji nav destên te derkeve wê başbe.

- Min navê laoê xwe kiriyê Berzan, ji kerema xwe wilo binvîse Berzan.

Dema ku wî navê Berzan bihîst, ji cihê xwe qevizî û bixrka destên xwe danî ser devê min.

- Hişbe..Kes vî navî ji nav lêvên te nebhîze. Ma tu nizanî ku navên biyanîyan qedexene. paşê tu misilmanî ne! Divê û gereke ku em nav û paşnavên sehabî û ûcaxan vejînin, bike Mûmemmed, Ahmed, Hesên, Elî yan jî Mistefa. Ev çî navên çewtin, ku ji nişkê ve hişê we vebûye û we dest bi van navên bê wate kiriyê, wek şêro, Xisro, Evîn û şêrîn. Hetanî kengî winê wilo bimînin??

Di ber xwede tiştekek digot:" Erê çima na, karbidest hemî wilo dikan".

Min êdî naskir bê di çî de dirame. Min destê xwe avêt bêrîka xwe û serê 500 wereqî belû kir. Bi lez ber bi min ve hat beşirî, girêz ji devê wî herikî û bi poşmanî.

- Tê li min negre ezbenî..Bixwedê ev ferman ne ji ba min derketiye, ji jor hatiye, lê nexeme, ezê jibo xatrê çavên te vî karî bikim û divê ku kes pê nizanibe.

Zerf ji destê min girt û li ber xwe danî bi nehênî nivîsand Xêzeran û bi dengekî bilind li min vegezan Berzan.Ban yê devê derî kir û zrf daxe dest û tembî lê kir ku ecele vî îşî biqedîne. Zerf ji ser masê firiya û li wê avaniya çar qat çû û hat. Karbidestên wê avanî yê tev de ber min ve hatin û pîrozbahî li min kirin. Kî bi ber min ve tê lîstak ji daxwazan amede kiriye, ji penêrê hilandî hetanî bi birxûl û nîsakn. Yê karbidest ber min ve hat û tema devê xwe xweşkir.

- Ez dibêm anha tu razî ye, ev kar hemû min jibo te kir.

Ez bi derncave daketim û hêdî hêdî ez biçûçik dibûm, hetanî ku ez giham derve, min xwe nedît, û ji biçûkbûna xwe, ez di nav wê gemara devê derî de winda dibûm.

---

1 ( ecnebî) gotineke erebî ye, ku tê wate ya biyanî, ev ji ber ku nêzîkî 200 hezar

mirovên kurd, di 5- 10 -1962 an de ji mafê hevvelatî ya sûrî hatin pashxistin.

PIŞTXÛZ

Mehmûdê Eko: mehmudeko@avestakurd.com

Jibo Beşîrê Mele ( Bavê Şahîn)

Hino hino ez hest dibûm ku Ode ya mi î çar qorzî bi ser hevde tê.

hestên mib beram berî xwe kelovajî dikirin, Ode ya min li dor diwaz deh ta bi paz deh M çar goşe ye. Lê ji nişka ve min didît ku bi ser hev de tê û min di zikê xwe de dugvêşê, di pêşî de min ji xwe re digot (Berkî ez westiya bim ji xewa wisan ez mijûl dibûm, dibe ku ez hê xilmaş bim ez ne razabim, yan, ez diramiyam û min ji xwe dipirsî.Çi di nav bera mirin û zendiyê de heye, ji bilî mûyekî zirav ku nayê dîtin û dibêjinê hebûn.

Ez di nava xwe de pirr dibizdiyam, û di nav rûpelên ramanan de hunda dibûm.

Ode û hatina wê bi ser hev de min jibîra dikir, di şiyarî yê de di razanê de di mirin û zendiyê de di hebûn û nebûnê de diramiyam.

Ez ji hundirê qalikê xwe derdiketim, û min ji xwe re digot.(Çi min û van tiştan di nav hev de heye..!?)

Di pêşî de min digot berkî ez dirêj kirî bûm, lê niha min tere derxist ku şipyabûm. Rengê çar goşeya Odê bi min dibû qutîkeke girover, kevzeka kesk xwe hilperikandibû ser, Ez hest dibûm ku Oksîcên kêm dibû, ji ber ku defê sînga min bi min giran dihat

hildan û daxistin, di mejiyê min re derbas dibû ku mirin wisa ye..! Ezjî nizanim çima wisan di ramanên min re dibuhurî. Gelo da ez xwe razî bikim ku ez heme..!?

Tiştê ku mejiyê min gelekî diwestan ewbû gelo ma valahî ya Odê bi kûve çû ye, min digt berkî pencere jî nêzîkî min e, berve diçûm lê mixabin min tutişt nedidît, ji bilî reşiyê pêve. Yek carna dengê zîqîna derî , bi rastî min derî jibîr kiribû, eger ne di wê dema kurt de ba , û ne ku Ba dergeh bihejanda û dengê zîqîna wî ba min bi xwe nizanî bû. Lê ew kurte dem zû bi zû qut dibû, ez pirr dibizdiyam,min dixwest ku ber bi derî ve herim, lê mixabin min jibîr kiribû bê li kîjan alî dikeve.

Ewê zîqînê di nava min de omîdek ava dikir, çi tiştê xweş di jiyânê dedihatî ber çavên min,hingê ez bi hezkirina xwe ya nazik û rewan hest dibûm, û min di xweşt ku nameyekê jêre binivîsim. Di wê tevlihevê de min dest ên xwe li pênuşê digerland,bi zehmetî tiştêk dikete nav lepên min, lê di cih de ez hest dibûm ku di nav lepên min de dilebite, bêye ku ez bizanibim çiyê, dengê qîrîna min hewl dida min ku ji dest xwe bavêjim.

Min xwe kar dikir ku ez rabim ser xwe, bi rabûna xwe re serê min li zikê Odê diket. Min berjorî xwe nerî, ku çi binerim ezmanê Odeya min ghişt ye ber min.!

Di wê kurte demê de min dixwest ku peşkeke av bi

ser çavên xwe de dakim, da ez hebekî bi ser hişê  
xwe ve bêm.

Lê tu tişt nedikete destên min, li şûna xwe  
vedgeriyam, lê mixabin min jibîr dikir bê ka ez li  
kîjan cihê rûniştibûm.!

Min careke dîtir serê xwe radikir, lê vê carê kerş û  
gemara nav beşt û beyikan di çavên min de hêlînên  
xwe çêdikirin, min bi carekê nema ber xwe didît.

Min dixwest derkevim, lê di giroveriya Odê de bê  
çare dimam pişt xûz, dimam bê omîdhunda dibûm di  
nav pêlên pirs û bersivan , û min ji xwe dipirsî: Gelo  
ma raste ez heme ..? Ma gelo ez ne mirî me..!?

Rêwindayî

Mahmûdê Ako: hawar@hawarkurd.de

Hêkên gêrgêrîkan baz û başoke ji wan der nakevin..!

Hêkên maran jehir di nava wan de heye..!

Ez dikevim şêweyên lehengan, geh Restem û geh  
Guhderz im.

Bi kişandina şûrê xwe serê sed mirovî dipekînim.

Tukes nikare şûrê min ji destê min der bixe. Ez  
tavim, ez mirinim.ez..!?

Lê ji nişka ve tu poşman dibû, ew axavtin bi te giran  
dibûn, û te xwe bi nermî ji nav wan ramanan  
vedidizî, û tu ber bi ramangeha herî bilind ve  
hildikişiya, tu li nik Xwedan û pêximberan  
radwesetiya. Te ji Zebûrê dest pê dikir, ta ku tu li nik  
Quranê disekinî, te hemû ji hev cida dikirin, û tu bi  
wan razî nedibû, belê te tev de bi Xweda re dihiştin.

Tu li pêximberê xwe yê pêşî divegeriya, û te gunehên xwe, negihanên xwe, hêvî û paşerojên xwe poşmanîyên xwe, tev de te bi huçkên Anahîta ve girêdidan. Dîsa tu qayil nedibû, û bi tinazî ji xwe re digot:

- Em destpêka sed salaekê nû de, hemû tişt bûye Kompyûter. Gelo ev raste yan em di xewnê de ne? Komên mafê mirovan "rêxistinên mişextan" civatên mehel û birçîbûnê "Parêzgehên nexweşiyên zikmakî". Hemî di jiyane de li aliyekê ne, û em û jiyana xwe li aliyekê ne. Gelo çima hêjî em bindestin, û tu kes dengê qîrîna me hesnake? Bindestên pakrewanên rojê, yê ji xwe bazdyîne, bindestên ramanên hişk û çewt, û neqebûl kirina yê din. Em hêjî bi wê taybetiya xwe ya bi serhişkî yê dijîm û dikin pesnê xwe.

Em ew Sînema Amûdê ay şewitî ne, em zarokên ku di zîldana xwe di qurmiçîn.

Em zindana Hesiça yê ne, em ew ciwanên ku wan miradên me bi êgir pîroz kirin.

Em ew qada Hermê Şêxo û Rengo ne, ku bi zor pişta me bi xêzên cotê xwe bi dar vedikin.

Hêjî em dijîm, di welatê xwe de bêgane ne, çawa dê raman bikaribe hilgire, vê neçariyê bi serî rabike?

Bi tenhatî ya xwe dijîm, bi mejiyê xwe yê zingarî.

Di destpêka sed salake nûjen de, di ferhengên civakî de ez û pûstekê wekû hevin. Gelo ev tev de hovîtiya mejiyê mine. Yan wisan pêdivî ye.? Her û her li ser

ya xwe dimênim, tevî wê ez dijîm, jiber ku mirin û xînrijandin bûne mîna bayê, mîna avê, mîna her tiştî ji min re pêwîste ku ez bimirim û pê serbilind im!!!? Hêjê hêviya xewnên min ewin, ku ez di welatekî serbixwe de bijîm. Gelo rastiyeke ku welatek ji boyî min bête avakirin.!?

Hêjê çar sînorên bi bumbe, û têlên bi qeramûşk di sînga min de mîna alozên zikmakî ne, her roj xwîna xwe dikim qurban ji bo azadiyê, lê azadiyê koçên xwe ji qada min bar kiriye.

Hêjê tivinga min di devê birayê min de ye, û bêyî pirsyarîn, bêyî ku bizanibim çima yan ji bo çî dibêjim:

- Tu kî ye ku tu şîretan li min bikî, û bibêjî ev şaşê û ev raste..!?

Û tu bi devekî tije dibêje:

- Tu bûyî sîxwirê çar komarên desthilat.!

Ez û te nebes bûn, dengêkî dî sînga ezman diqelaşt:

-Ev qad ya mine, nabe ku tu li vir şerê xwe bikî, here başûr, here bakur, here dogehê, lê ji vir şer neke.

Her tişt hatiye guhertin, di rojava de roj piştî rojê sînor ji navbera komaran tên hilkirin, lê li rojhilatê roj piştî rojê sînor û bumbe pirr dibin. Ne tu welat û ne jî tu millet weku min, ne xwîn ne jî zindan ,ne jî mişextî daye. Û em roj bi roj dibim terorist, teroristê qada qedexkirî, gelo raste em û welatekî serbixwe ne li gorî hevin..! !?

Kerwanê bêdengiya te, te dajo, bi kûde, tu bi xwe jî

nizane..?

Lê ya baş ewe ku hîn jî tu heye û li ser qada qedexkirî dijî.

Ji neçarî tu dibe belengazê pakrewanekî ji birakujyê bazdayî ! Dijminê te birayekî bi guneh û ne guneh hun hev dixine xefk û dava de?

Di kolanên bê wariyê de dibim nêçîra keçeke Rojavayî, mirovekî hov im di pêxila jibîrkinê de dijîm.

Di bazargehên ramanan de bê par û pişk dijîm, di leystikên genî de werdibim, bê dadvan tême tewanbarkirin. Bê dadgeh tême zindankirin, û ez bi bê gunehî têm kuştin, û dîsan jî dijîm.

Bê sirûd, bê al bê sînor di himbêza dayika xwe de, weku mendalekî bi qehfikan, bi xar û kaban dileyize. Di jiyânê de dileyize di mirinê de dileyize, bi hêviya ku di xewna bê xew de, welatek bê avakirin, xewnên xwe şêrove dike, di şiyariya xewê de xewnê de dilorîne, û dibe temaşevanê mirina xwe, dibe gorkolanê jiyana xwe, dibe xefk û dava evîna xwe, dibe xwînfiroşê xwîna xwe, tevî wilo jî dijî.

GOTINEKE MEZIN

MAHMÛD AKO

Demê buhar dibişkivand, hêdî hêdî hêviya min bi jiyânê ve avis dibû. Roj li ber roava bû, aso bi nazenî pesnê xwe ji xweristiyê re dida, li ser kenarên deriyê bakur, ez û dilê xwe yê şikestî dibûn temaşevanê pepûkiya xwe, dibûn xewn ne serjêkirî, ez û hestên



xwe yên reben û daxwazên qedexekirî, bi pêlan re dihatin sema.

Çiqasî pêlan xwe bi hêz dikirin, ewqasî ez û ramanên xwe dibûn hundabûn. Wêneya çar sînorê bombe kirî û hêviyên min diketin nava pêleke bê hedan, yek bîranînên penaber xwe di mejiyê min de dilûsandin, pirsin bê ra xwe di mejiyê min de belû dikirin.

Di hinavê xwe de wekû volkanekê dikelim, û ew pirs di mejiyê min de dibû kuînorek û ji nişka ve der dibû, bi elem û xwîn di hinavê min de kulekên şahiyê vedikirin.

Ma tû dizanî ku îroj roja bîst û yekê Avdarê ye..?  
Îroj Newroza pîroze..!?

Hingî ez berzûrî ezman dibûm, û min ji xweda dixwest ku tavekê bibarîne bi ser min de, da agirê hinavên min vemrîne.

Çiqasî min dixwest ku ji bersivê bazdim, lê weke ku bi min re (C)êbûye bi min re xwedî bûye, mîna bêhna min di nav parsûyên min re di(C)û û dihat, çiqasî min çavên xwe digerlandin, da ku ez hinan bibînim û ji wan re bibêjim:

Her sal û Newroz li we pîroz be, her sal agirê kawa li ser serê (C)iyayên qedexe bê dadan.

Lê mixabin ez dibûm guhdarê gotina xwe, pêlan bi min re dikir dawet û zemawend, dû rondikan çavên min pîroz dikirin û digotin: Her sal û Buhar bi te şax bide Newroz.

Ez û pêlên bê hedan û deriyê bakur, daxwaz û hêvî  
tevî hestên xwe yên şikestî dibûne mêhvanê  
rewrewka ku jêra dibêjin niştimanî.

MELE ROJÎ NIMÊJ GUNDÎ Û

TOFAN

Cûdî Amed: alibaran@future.net.tr

Ez bi çukî pir merqliye civata bum. Eşkereye hun jî  
ku zanin berê di eşîrekede mal mezina kahwe  
çêdikirin. u hemu gele eşîre dihat we ' malê.:  
Malame jî di eşîrede mal mezin dihat nîşandin.  
Eşîrek Metîna li perê kerejdaxê heye( Bi bajarê  
Dêrikeve girêdayne)Mezina digotin va metîna pir  
nabênawanu" rojî u nimêje zêde tune buye.  
Lê bele der dorawan hemu zedê holê (DÎN) di  
parêzin:, Mezinakî wanî bi akil( H:S) dibêjî " gelî  
gundîye u cîrana kes bi me bawernabin, herkes ji  
mere dibêjin ev gund bê dînu bê îmane gelo meha  
remezane tê ka em ji gundre melakî bigrin(GAZÎ  
KIN) hem deru dor baweryawan bi me werêhemjî  
mele meha remezanê nimêja tirabîha ji gundre  
biki.!. Melakî ji gundekî Bakostanê (bakurî Mêrdînê  
ye) digrin. Herkes der dor dibejin maşallah ev gelana  
hatin îmane u îmanawan gelek kedîmbun.u a..  
Gîrîng gundî pir ji melexwe hezdikin ,malum nimeja  
tirabîha --32 rik ati ,lê mele gelekî zu bi lez diki.Ji  
ber ku zu diki gundî jî na westin.  
Neyse em direjnekin,roja Arafatê tê mele xebatawî  
diqedi(Xelasdibi) Dibeji" Gelî gundîye Ezîz hun

desturamin bidin ezê herim malaxwe zaroekêmin li hêvîyaminin. E... Gundî dibejîn hoce (Mele) bi xweşî herê u oxurate a..Elî u mihemedbê.Mele dibeji , ma gelî gundîno hun zekatu fitrêmin nedinmi?Axê gund (H::S) dibeji ya star!.. hoce ma kelame xwede u ayete Kuranê îbadet bi pera di ,ma key tu diki me gunehkarbiki? Mele Dibejî" ah ah ! ..gelî gundîno u axa mizanîbu hun çî kerin : Lê hun nebejin mele nezani bu min sibê" sehur seatekê paşê iftarjî seatekê berê bi we dida xwarindin,Çîmkî Gund di di newale de bu" u nimêja tirabîha jî min 32 Rik at nekir zatî ez dua jî nizanim" Axajî dîbejî hey!..dahşik( Kurê kere) em key pir ne zanin.Me kesekî wekta nimeje abdest negirt u rojî jî me nav roje me bi dizî xwarin (nan ) dixwarin..De hadi ji terê oxurbê. Lê Dibejin di civatêde meroveki kor, yekî ker;yekî topal, u yekî .dîn( Çîplaq(tazî) hebuyê.Li axe u mele guhdarî dikin.Dibejîn ma Axe em xulam va edalet !. kevire ji ezamana de bibarê ma çima tu heqe mele ' nadê?. Tam di wê deqde evr gurîn vêdikeyi ( GuRiNEK Lî EZMANA :çêdibê): Mele dibejî ah!..wele tofan bi ser wede hat. MerovêKer dibejî" law denge hacucu macuca tê kor dibeji ha!..wan hatin; E..tazî dibeji law vana ye werin her tişte me bistînîn ( me tazîkîn) Topal dibêjin me key hun çî sekinî nê hadi em birevin. bi rastî Gundî jî mêzedikin teşkele çêbu ; wanjî bawerkirin "Dibejîn" Axa va ne çîrokin? li me jî eyan buye tofaneke bi sermede werê heqe mele ka

em bidin; ew bi xer; em selamet, "Axa dîbejî Ah!..  
Mele te çi bi seremekir ? Dîn u bakil hemu ji te  
bawerkir. A. ji terê zekat u fitre ; lê dîsa kesek; deru  
dor ji me bawernakin Ku me rojî u nîmej kirîyê!  
Hadê oxurb'ê Hoce...

Cûdî Amed

TU CARÎ NABERSIVE

Îrfan Amîda

Hinek jê siya berêvarî ne

Bibengî

Ew jî wanî

Baran bibariya

Dibişirî

Tu tişt di mista kemanê de nepeniyên di nav tariyê  
de xwe qurnisandine nikare ji nav derxîne. Bi  
nermî... hêdî hêdî...ji hev veçirîne.hemî nepeniyên  
jiyanê. Evînên negotî. Pirsên veşartî û hestên  
taloqkirî. Ê...ê tu.

Ez îroj dîsa di wê neqebê re derbasbûm. Dîsa  
goşiyên wê dêliyê di şaxên wê de bûbûn mewîj. Reş,  
wekî mewîjka çavên te xweş, lê ne kûr û ne dûr.  
Keskokek pê vekirim. Demekê li benda gumgumoka  
ku te teriya wê qutkiribû mam. (dema ku tu çûye  
nema teriya xwe bel dike). Bi hestiyariya te lê nêrim  
ku li bergera min bibersivîne. Lê bi heman awirên  
bêwate nêrî û ez li bin siya wê dêliyê rûniştim. Min  
ew kilama roja ewilî got. Kengî stranan li bin siya  
wê bêjim ji nûve dibişkive ew dêlî.

Zîvirîm û baran bariya

Qudretek xwedayî ye an lêhatinek e nizanim, her ku di wê neqebê re derbas bim, êvarî baran dibare.

Û her ku baran bibare gul û çîçekan tînim hundir "bêhna esir". Min axa wê guhert yekşema çûyî. Min ax bêjing kir û hinek jî zibil tevlê kir û li quncika wê yî her dem lê ye ew danî. Ji xeml û xêza xwe ji bejn û bala xwe hê tu tişt winda nekiriye.

Bêhna wê ji min tenê re zêde ye. Guman dikim bi vê hinekî stuxwar e û hew... dengê baranê tê te jî gelo. Li cem te jî dibare. Peşkên baranê li cem te jî wisa bi bengî ji têtê kemanê diherike? Li wir jî heta te derxe şaneşînê û bêhna porê te bimijin, bigirin peşkên baranê li bûxa pacên te. Yên wir jî xweş tîn nivîsandin gelo hestên te yî negotî?

Kî ji dêlva hertiştî ker dibe ji bo tu bibe sibeh?

Û dîwarên te, têra şevên ji xwêdanê difetisin, gêj dibin?

Şewqa lempê sermest dibe heta qudûmê stêrkan bişikê, ji ber çurûskên çavên te.

Ger baran dibare tu jî niha li kemanê guhdar dikî . melodîya kîşwera evînê ye dengê kemanê. Lê divê baran bibare. Ku dawerive rehan û êvar li bin çengan xilmaş bibe.

\*\*\*

Bajar di xew de bû

Ên mayî jî çûn

Çêlikên kevoka şîn jî bi firê ketin

Lê çûna wan ewran tu carî neşîbiya çûnan  
Lê ew dengê kemanê yê hêmayî her dem dadiwerive  
nav per û baskên bawerîyan.

\*\*\*

Min wêneyekî, dîmenek ji gola Wanê kirî çend roj  
berê. Gola Wanê ji xwêdanê fetisîye. Û dêra girava  
Axtamarê bi hesretên Tamarê zengar girtiye.  
Rengpayîzî. Bawer dikim ku wênesazê vê wêneyê jî  
mîna te ji payîz û hesretan hez dike. Lê min ew  
wêne li cîhekî ku şopa min pê nekeve danî. Li cîhekî  
ku şopa min pê nekeve, lê dengê kemanê bibihîze.  
Ji ber ku payîz bê hesret  
Û hesret bê keman nabe  
Ma tu jî li kemanê guhdar dikî?  
... Destê min nema li pênuşê digere. Her ku  
dixwazim bi navê te dest bi helbestekê bikim. Bi  
mewîjkên çavên te binêrim li stêrkan baran dibare.  
Baran bibare hibra pênuşa min zuha, mijankên min  
şil dibin. Û "bêhna esir" digirî bi ser min de. Niha jî  
ew û binevşa te bi destê xwe çandiye. Bi nalîn û  
narîn.  
Ne tu  
Ne ez  
Ne payîza sala çû.  
Dema tu çû  
Baran bariya  
Binevşa narîn giriya  
... ger tê bê ezê şivên nû bidim dêliyê.

## BÊXEM

Şukru Aşvan

Bi banga karkerên şaredariyê ên sergoavêj, Bêxem ji xew rabû. Dengê sergoavêj yê şaredariyê hîn jî li kuçeyên Mêrdînê belav dibû. Yeko yeko li deriyê malan dixist û bang dikir. “Zibiiil! Zibiiil!” Bêxem, ji ber ku xewa xwe baş nestendibû, ji vî dengî gelekî eciz bû. Bêxem, her roj ê rabe taştê bixwe, porê xwe bişo, li ber awênê bi deqan bisekine û porê xwe şeh bike, ji serê xwe heta lingê xwe, bi caran di ber çavan re derbas bike, ji paş û pêş ve li xwe mêze bike û pişt re ji mal derkeve. Gelek caran heta nîvê şevê li qahwexana û li sînema wextê xwe derbas dikir. Gelek caran jî heta sibehê nedihat mal û dayika xwe ji heyra xwe re bêxew û çav li rê dihişt. Bêxem tu kar ji bo debara malê nedikir. Carna rojekdidu dixebitî û tenê têra xwe dirav bi dest dixistin. Carna jî ku diravên wî diqediyên, ji birayên xwe distend. Her ku birayên wî û bavê wî dixebitîn û debara malê dikirin. Tiştê ji Bêxem nedihat xwestin û tu caran di xema tiştê de nedima. Li cîhanê çi çêdibû, çi diqewimî ne li ser bala wî bû. Guhê xwe ji her tiştî re girtibû. Ji xwe ji ber vê yekê jê re digotin Bêxem. Bêxem xortekî hivdesalî bû. Bejin zirav û dirêj, çavên reş, dev û lêvên wî yên li hev bi porê xwe yê ku di ser her tiştî re digirt, xortekî pir bedew bû. Bêxem, weke her roj ji mal derket û berê xwe da

dibistanê. Dibistan nedixwend, lê keça ku jê hezdikir dibistan dixwend. Sedema çûna wî a dibistanê jî, ji bo wê bû. Rojekê ku hev nedîtana debara wan nedibû. Dema ku yara wî ji dibistanê derket, bi hev re dimeşyan û di nava kuçeyên Mêrdînê dîrokî de bi destê hev dirtin. Weke ku cîhan tev ji bo wan ava bûbe û xweşiyên jiyane tev xweşiyê wan be. Yara xwe gihand ber mala wê û xatir jê xwest. Bi tena xwe li kuçeyên bajêr ma bû. Ji bo pêdeviyên xwe bibîne berê xwe da mizgeftê. Mizgeft, dîrokî bû. Dema ku ji mizgeftê derket, lingê wî, ew li gelek deverên bajêr yê dîrokî gerandin. Tu carî wusa ne digeriya. Ji dîrokê jî tu tişt fêhm ne dikir û li medresê, li dêrê û gelek ciyên dîrokî geriya. Demeke kurt sekinî û di ber xwe de keniya û got : “Ma ez li van kuçan li qîra xwe digirim? Ka çi karê min li van deran heye?”

Roj bûbû esira teng. Bêxem, îcar çûbû ciyê herî bilind, ber kela Mêrdînê û li temamê bajêr û beriya Mêrdînê temaşe dikir. Beriya Mêrdînê mîna deryayeke bê binî dihate xuya kirin. Li beriyê ku weke okyanoseke mezin rast û duz, şûv (nadas) ên reş û sor di nav çandiniyên kesk û şîn de, weke gulên fîstanê Binevşê bi aheng bûn, xeml û xweşikbûneke din dida derya rengan û xwezayê. Bêxem, li hember xweşikbûna xwezayê û bajarê dîrokî mest bûbû. Bayê ku dihat, ew dixist nava aramiyeke pir xweş. Çavê xwe girt û bedena xwe da



ber bayê hênik. Dema ku bêhna xwe distend, ew hewa paqij dikişand heta ser kezeba xwe. Ba, gelekî hênik bû, lê wî bayê hênik nav û dilê wî germ dikir. Porê wî li ber ba tev li nav hev ketibû, lê porê wî ne li ser bala wî bû. Mîna peykerekî wisa di ciyê xwe de sekinî bû.

Ji nişka ve tişteke hate ser milê wî û weke ku bi hêrs û tirs ji xew şiyar bibe veciniqî. Di nava tirs û peloşînê de dema ku li xwe zivirî. Zilamekî weke zebellahekî li hember xwe dît. Zilamekî dirêj, rih û porê wî tevlî hev, qemer û çavê wî fireh û sor bûn. Kîsikê çavê wî hingî qermeçîbûn, bi ser rûyê wî de dieliqin. Pêlaveke qetandî di lingê wî de û kincên wî jî tev bi qilêr û qitnik bûn. Qermûçekên ser çavê wî û eniya wî tev ji toz û gemarê tije bûbûn. Emrê wî qederê çil çil û pênc hebû. Hevdên spî ketibûn rih porê wî. Şûşeyeke şerabê di destê wî de li bêxem nihêrî û got: “Ne arýyorsun burda yeđenim? Bir fýrt çek de kendine gel ha!” Bêxem lê zîvirî û got “ Yok içmiyorum sađol” serxweş: “Madem içmiyorsun, ne arýyorsun burada? Burasi benim gîbî duşunen efkarların yerî dir. Şû güzelîm manzaralara ve tarîh kokan mekanlara baktıkça ferahliyorum. Baksana şû guzellîde. Kîm bilir bû cođrafya da bû topraklarda, bû şehîrde kaç uygarlýk yaşadi. Kaç uygarlıda analik ettî? Bû güzelîm şehîrîn bîr taşı, bîr uygarlıdınî bîr medeniyetin sîmgesîdir. Bunlari bilmiyordun?” Bêxem: “Hayir bilmiyorum.”

Serxweş: “Bilmezsın tabi, merak etmiyorsunuz ki! Madem yaşadiđin cografyayi ve tarîhî bilmiyorsun, ne diye yaşıyorsun? Bunlarý bîlmezsın kendîni de bîlemezsîn. Ot gîbî gelîr, saman gîbî gîdersîn. Kurt musun?” Bêxem: “Evet” Serxweş: “hele bak, Kurtmîş. Îspatla o zaman kurtluđunu. Olmayan bî şeye sahîp olmak gîbî bîr şey. Bunu soylerken hiç utanmıyor musun?”

Bêxem qet tu bersîv neda. Serxweş bi bazdan ji wê derê dur ket. Wexta ku Bêxem gihîşte qahwexanê, ba hevalên xwe, tiştên ku di serê wî re derbasbûne ji wan re qal kir. Hevalên wî tev kenyan û henekên xwe pê kirin. Dawiyê jê re gotin ku ew kesê serxweş demek dirêj mamostayî kiriye û ji ber ramanên xwe ve gelek caran ji aliyê dewletê ve hatiye binçav kirin û di şkencan re derbas bûye. Loma aqilê xwe wenda kiriye ango dîn bûye. Çewa Bêxem ev tişt seh kirin, gelek matmayî bû. Ê bandora axaftina serxweş hîn jî lê esr kir.

Di qemika êvarî de Bêxem vegeriya malê. Tu carî weha zû nehatibû mal. Malbat tev mabûn ecêbmayî. Bêxem şîva xwe xwar û derbasî menzela (oda) xwe bû. Qederekî runişt û cixareyek vêxist. Kete nava lêhurbûnê. Di fikirî û dipoç(j)inî. Lêhurbûna wî tev li ser kesê serxweş, dînîtiya wî û axaftina wî bû. “heger ew dîn be, çewa dikare wusa biaxife, dînîntî çiyê! Evî di axaftina xwe dixwest çi min re bibêje? Sedema dînîntiya wî bo çîna wî be, dewlet çima li

hember boçîna wî derdiket? Min jêre ez kurd im, çima bêhna wî teng bû û kurdîtiya min ne pejirand?” Çixara wî, di nava tiliyên wî de qediya bû û heta ku tiliyên wî ne şewitî, qet li xwe hay nebû. Dema ku tiliyên wî şewitîn xwe ji nava pirsan xelas kir û ji nû de dest bi lêhurbûnê kir. Kesê ku xema tu tiştî nedikir û ne dixwar, gelo çî bi wî hatibû ku ewqas xemgîn bûbû? Malbata wî jî bersîva vê pirsê digeriyan, lê tu bersîv ne diditîn.

Di sahura sibehê de, Bêxem ji xew şiyar bû. Hîna şefeqê nû avêtibû. Vê carê ne bi dengê sergoavêj, bi dengê azana sibehê re bûbû. Ew jî li xwe mabû ecêbmayî, ku cewa weha zû rabûye. Ser û çavên xwe şuşt û qedimî ser sifrê, taştê xwar. Careke din weke her roj dengê sergoavêj jî kete guhên wî. “Zibiiiiil ! Zibiiiiil !” lê vê carê, ji dengê sergoavêj qet aciz nebû. Taval pê gelek xweş dihat.

Bêxem ji mal derket, lê vê carê necû dibistanê. Di meşiya, lê nizanibû ku wê here kuderê. Mîna kesê ku daxwaza xwe wenda bike û hinek wî bi zor bînin derekê, lingê wî careke din ew bir ber kelehê. Dema ku gihîşt ber kelehê, çû li ser kevirekî runişt û serê xwe bera ber xwe da. Li xwe difkirî, gelo li çî digeriya? Li tişteki digeriya, lê wî jî nizanibû li çî digere. Bajar bêdeng bû; weke goristanekê ku bi salan mirovên mirî tev tê de kom bûne û kesekî zindî nayê serdana wan.

Li katjimêra xwe nihêrî. Bûbû neh. Rojê germahiya

xwe, bera ser xwezayê dabû. Paçên bajarî dîrokî bi pencên rojê dibirîqîn. Careke din li dora xwe nihêrî, kesek tune bû. Êdî kesê serxweş jî ne li vê derê bû. Biryar da, ku ji vir here, dema ku cara dawî li dora xwe nihêrî, çavên wî bi kolanê ket. Kolan li binya bajêr bû û girseyeke gel li vê derê kom bûbû. Bêxem boçînî “gelo ev girseya gel ji bo çî li kolonê civiyane ba hev?” Bêxem îcar vê boçîna kolanê dilê xwe di cih xistana. Wexta ku xwe ji ber kelehê bera jêr da, di sukê re derbas bû. Mirov weka miriyan li nikhev dimeşyan, dengê dikançyan, himalên, fêkîfiroşan û kesên ku asûk dikirîn tevî hev dibûn. Careke din di ber xwe de kenîya. Ji ber ku berî niha bi qederekî li bajêr mêze dikir û digot qey kesek tê de tune. Loma bi xwe dikenîya da ku wuha teng fikirî bû. Hîn ew bi xwe dikenîya, dengê ji pişt wî hat. “saqiiin! Saqiiin!” ev jî dengê himal bû ku rahiştibû sarkerê û di nava sûkê de dimeşiya. Bêxem, li himalê ku rahiştiye sarkerê mêze kir, mirovekî extiyar bû. Temenê wî doran şêtan bû. Careke din Bêxem matmayî bûbû weke kesekî ku çavên xwe nû ji cîhan re veke. Bêxem meşa xwe domand û ber bi kolanê de meşiya. Nêzîkî li kolanê kiribû û dengê dev û zirnê, dengê lîlandina pîrekan û dengê druşmên ciwanan diketin guhê wî. Qederekî sekinî û neçû nava kolanê. Mêze dikir lê wate nedida wê coşê. Dixwest ku fêm bike, ev coş ji bo çîye. Di emrê xwe de tiştêkî bi vî

ewayî nedîtibû. Li nava kolanê agir bilind dibû û li dora êgir bi sedan kes, keç û xort, kal û pîr, zarok û jin tev kom bûbûn û govend digirtin. Bêxem ew kesên ku li kolanê dîtin gelek nêzêkî xwe didîtin; ji ber ku dê û bavên wî kurd Bûn û ew jî kurd bû, lê tucar di civaka kurd de jiyan nebûbû û hatibû bijaftin. Weke ku ew mirovên mirovên kolanê tev ji berê de dihatin nasîn, ewqas ew nêzîkî xwe didîtin. Hestên wî hêdî hêdî ew ber bi kolanê de dibir. Lê hîn gava xwe ne avatibû kolanê, polisan bi milê wî girtin, serê wî di ber de tewan din û berê wî dane eşkenceyanê.

Bêxem hatibû girtin lê nizanibû ku ji bo çî hatiye girtin. Ji girtina xwe re tu wate peyda ne dikir. Di şkencê de gelek pirs jê di hatin kirin. “Oxlum konuş! Kîm sizî orgutledî. Bize bilgî vêr, bizim ewladimiz ol! Genclixine yazik olur! Bize orgutun baxlantýlarýný vêrmezsen yanarsin! Kîmlerle, neredede îlişkî kuruluyor? Sixinaklar, sîlahlar nêrde?” û hwd. Gelek tajang û siqêv jê re digotin.

Bêxem tu tişt ji axaftina wan û lêdana wan fêhm nedikir. Loma jî pirsên wan tev bê bersîv dihîştin. Piştî heft rojan Bêxem hate berdan lê Bêxem ne Bêxemê berê bû. Ji kotek û lêdanê ne dihate nas kirin, mabû cern û hestî. Wexta ku hate berdan, dayîk wî, bavê wî, xwşk û birayên wî teva ew himbêz kirin û rondik bi ser de barandin. Malbata wî jî cara yekemîn bû ku tişteki weha dihate serê wan.

Ew jî mabûn ecêb û sosret. Bi dehan kesên ku berê nedihatin navkirin, dihatin serdana wî. Tev yên ku li kolanê pîrozbahî dikirin û çaxa ku Bêxem ketibû binçavan tevan ew dîtibûn. Ango kesên welatparêz bûn. Bi Bêxem re ketin nav axaftin û gotubêjeke kûr. Bêxem bi axaftina wan re êşên xwe jibîr kirin û li wan gohdar dikir. Ji ber ku di warê welatparêziyê de tiştek nizanibû, tenê gohdarî dikir û carna jî hin pirs ji wan dikir. Êdî ne dixwest ku kesên welatparêz ji ba wî rabin.

Roj bi roj têkiliyên wî û welatparêzan zêde bû û hêdî hêdî hînî gelek tiştan dibû. Gelek caran jî li gora zanebûna xwe dikete nava hewldanan, bi van hewldanan re her ku diçû têkiliyên wî zêde dibûn. Lê ji hêla din de jî têkiliyên wiyên civaka kevn qut dibûn. Yara wî ya ku li dibistanê dixwend, dema ku guhertina bi Bêxem re dît, revî revî jê reviya. Lê êdî civaka berê ne ser bala Bêxem bû.

Têkiliyên wiyên bi şoreşê re germ tir bûbûn û sala wî di nav şoreşê û welatparêzan de qediya bû. Di hundirê salekê de gelek guhertin di kesayetiya xwe de pêk anîbû. Di vê demê de du carên din hatibû binçav kirin. Di van binçavkirinan de îcar li ber xwe dida û êdî dijminê xwe nas dikir. Dema ku du Salê wî û naskirina şoreşê qediya, ew jî gihiştibû radeyekê. Têkilî bi şervanan re danî bû û xebata xwe bi wan re di meşand. Qederê salekê jî bi vî awayî xebatên xwe domand. Ji ber ku ji aliyê dijmin ve

hatibû naskirin û eşkerekirin, biryar da ku bibe  
şervanên azadiyê. Dema ku ev biryar da, pirsar di  
biçîna xwe de da. Êdî Bêxem çûbû, bûbû  
Berxwedan.

Ji girtîgeha Mêrdînê  
Felemezê Gunikreş  
Îbrahîm Seydo Aydoğan

1.

Min jî her ji xwe dipirsî, ka gelo çima navekî min î  
weha ecêb heye. Min fikir û nedikir, min tu mahne  
nedidayê û ji ber vî navê xwe yê ku herkesî henekên  
xwe pê dikirin, min her fedî fikir. Çima wek yê  
herkesî, yê min jî navekî xweşik tune bû?

Felemez! Tew! Bala xwe bidîyê hela! Kî dizane bê  
wan ev nav ji ku dîtiye!

Mîna ku mirov bibêje "Bahcanê reş!

Dibêjin ku qereçîyekê ev nav li min kiriye. Bala xwe  
bidîyê hela, lo!

Rojekê hatiye cem dêya min. Hevdu jî nas nakin ha!  
Li zikê dêya min nihêriye û gotiye,

"Min xewn dîtiye û zilamekî rîhspî ku nûr ji rûyê wî  
dibarîya, ji min re gotiye sibehê tu ê herî malekê û tu  
ê bibînî ku pîrekek bi heml e. Xwedê Teala ê kurekî  
bide wê. Bila navê wî bikin Felemez."

Dêya min jî bi ya wê kiriye. Ê ka gunehê min çi ye,  
ji bo Xwedê? Hela bê kê nîhaye wê qereçîyê! Tu  
dibêjî qey kes nemabû, çûye xewna navê min dîtiye,  
lawo! Hema hey te dîtibû, qey te navekî xweş bigota

nedibû, yan jî te ew rîhspîyê ku hatiye xewna te,  
bera ser xwe bidaya, ji te re ne çêtir bû?

Ji ber vê yekê, ez her bi malbata xwe re dixeyidîm,  
hemû li ber çavên min reş dibûn û diçûn. Ji xwe, min  
heta niha qet ji wan hez nekiriye. Tu hevalê min jî  
nîn e. Min têkîlî bi kê re danîya, gava min navê xwe  
digot, bivê nevê yek derdiket û dîsa henekên xwe bi  
min dikirin. Ji ber wê, min li kuçe û kolanan, hercar  
şer derdixist. Gelek caran dev û pozê min di nav  
xwînê de diman û ez vedigerîyam malê û ji lewre  
dêya min û bavê min li min dihatin xezebê û li min  
dixist. Ez bi darekê ve girêdidam û bi qayîşa bavê  
min li min dixist. Her ku min derbek dixwar, min  
diranên xwe dijidandin û sûnd dixwar ku ez ê rojekê  
heyfa van hemû tiştan hilînim. Ez ê dinyayê bi ser  
serê wan de xera bikim, ez ê bikim ku ji tirsaxezeba  
min newêribin li çavên min jî binihêrin.

Heke ez piçekî xweşik bûma, belkî ev tîpa min jî li  
serê min nebûbûya bela û nebûbûya sedema ku  
hevaltîya min ya bi xelkê re têk biçe. Xwedayo,  
hema ez çenekî xweşik bûma, hebekî çeleng bûma,  
ma dê çi pê bihata! Hingê keçikên vî bajarî tevde dê  
bi pey min biketana û lawik jî ji bo ku nêzîkî  
keçikan bibin, dê mecbûr bimana ku bi min re  
bûbûna heval û têtetana bin emirê min.

Çi gava ez ji kuçe û kolanên ku êdî ji bo min bûbûn  
qadên şer, di nav xwînê de vedigerîyam malê, ji  
lewre te digot qey mirovên dinyayê tevde bûne



dijminên min, min nifir li wan dibarandin û min digot; "Sebir ya Felemez, sebir!". Her ku min berê xwe dida mirêkê, min berê çavên xwe digirtin û min di dilê xwe de dia dikir ku gava min çavên xwe vekirin, rûyekî din were pêşberî min. Rûyekî hebekî xweşik û lihevhatî. Ez dibûm kûçik û derdiketim. Gava min çavên xwe vedikir jî te digot qey ez ji berê nexweşiktir bûme, bêvila min xwartir dibû û dipelixî, guhên min bel dibûn, devê min mezin dibû, çavên min di bin birûyên min de wenda dibûn. Wê gavê, îmana min ji min diçû. Ez hey li ber Xwedayê bedewîyê digerîyam û min wek keran digot qey ew ê diayên min qebûl bibin. Welhasil, ez berê gelekî dilsaf bûm, bi gotineke din, ez ker lawê keran bûm! Carinan ez li ber hin filîman rûdiniştim û min digot hela bê ez dikarim xwe bişibînim hin lehengan? Tu dibêjî qey şensa min e! Çi zilamên nexweşik hebûna giş dişibîyan min. Min lê nihêrî ku ji derveyê vêya nabe, min got ez ê xwe bi rastî jî bikim weke wan. Belkî qedera min jî li ya wan bê. Ji ber ku gelek caran zilamên nexweşik jî ji xwe re hez kirînin weha peyda dikirin ku mirov lê ecêbmayî dima. Tew carinan ew jî dibûn serleheng. Ma qey tişteki weha dê dernekeve pêşîya min jî carekê! Ji ber ku min di piçûkanîya xwe de, gelek caran şer kiribû û bêtir jî min lêxistin xwaribû, ez êdî ji tişteki neditirsîyam. Ya rastî lêxistinê nema tesîr li min dikir. Min demîna xwe girtibû. Carekê ez di kuçeyê

re derbas dibûm û gava min dît ku çend xortên taxa me li hev civîyane û bi kaban dilîzin, min jî hema xwe da ber dîwarekî û ji dûr ve li wan temaşe kir. Min çî qasî dixwest ku yek ji wan bangî min bike û bixwaze ku ez jî têkevim nav wan û bi wan re bilîzim. Ji ber ku min tu carî nelîstibû û kesekî ku vê lîstikê rê min bide jî tune bû, ji min re bûbû hesret ku hema carekê bi tenê be jî ez ji dêleva yekî kabê biavêjim.

Li taxa me, xortikekî dirêj hebû. Bi qelafetê xwe du caran li min bû. Birûyên wî yên gir û reş di ser çavên wî yên piçûk de ku mirov digot qey yek ji wan şaş e, wek simbêlekî boq dixuyan û digihaştin hevdu.

Heşayî civatê, hema bi hersê navên Xwedê, eyn weke kerekî bû. Xelk tevde jê ditirsîyan. Dihat gotin ku gûzên li sînga xwe dixê û esrarê jî dikişîne. Ji ber wê, tu kes newêrbû li ber wî rabûya.

Gava wî kerê hanê, ez dîtîm ku ez ji dûranê li wan dinihêrim, hema rabû, hat cem min û bela xwe di min de da. Bi pişta destê xwe li sînga min xist û got:

- Te xêr e, lawê min; tu weke qewadan li me dinihêrî?

Ji bo ku ez bersiveke tûj bidimê û ew sedema şerekî li gora dilê xwe, bi dest bixe jî mîna ku henekên xwe bi min bike, di ber re jî dikenîya.

Ez şaşo maşo bûbûm. Tirsîyabûm jî. Min got çû ji min de! Vî kerê hanê dê min tirek bike û berde. Hê min devê xwe tev dilivand ku ez jê re tişteki xweş

bibêjim û wî nerm bikim, hema min dît ku lêwik yek bi ser bêvila min de ve kir. Ker lawê keran, pir xurt bû! Ez ji ber êşê, tu nemabû ku biketama erdê. Min xwe bi zorê li ser lingan digirt. Mêjîyê min sekinîbû. Hêsiir ji çavên min digindirîn xwarê. Zingînî ji serê min dihat. Lêwik bi herdu guhên min girt û serê xwe rakir. Hê min nû fahm kiribû bê ew dike çi bike, got "gurm" û bi hemû hemda xwe serê xwe li nav çavên min xist. Êdî min digot qey bêvila min ji min ketiye. Min nema ew his jî dikir. Serê min bi tamamî gêj bûbû. Xwîna min sekinîbû. Lawê qahpikê tişt di min de nehiştibû! Kêra min di ber pişta min de bû, lê halê min nemabû ku ez destê xwe biavêjimê û wê bikişînim jî. Piçekî sekinî û gava ez xwarî erdê bûm û min dixwest ku bêhna min hebekî were ber min û ez rabimê, kûçikbavo pehînek di nava min de lêxist ku bêhna min bi carekê ve biçike û ez li wê rastê dirêj bibim.

Heta ku bêhna min nehat ber min, ez ranebûm. Min dizanîbû, heke ez rabim ez ê dîsa bixwim. Weleh, min hebekî bêhna xwe berda û min pişta xwe hêdî hêdî rast kir. Wê gavê, du kesên din jî ku ji wî jî kertir dixuyan, hatibûn li ber min sekinîbûn û dikenîyan. Ji zarokatîya xwe de, ez pê dizanim. Gava sê ker werin ba hevdu, ew ê misoger tişteki xerab bikin ku xelk ji wan re bibêjin, qantir! Min di serî de pê dernexist. Ma tişteki weha qet tê bîra mirov? Lê gava ku yek ji wan ber bi min de hat,

qayişa xwe vekir, derpîyê xwe jî daxist û bi ser min ve hat, hê nû min fahm kir bê ev dixwazin çi bi min bikin.

Qey gava hişê mirov ji serê mirov diçe û gelekê hêrs dibe, an jî weke ku hin dibêjin "sixortayên wî diavêje" mirov nabîne bê çi dike. Hema min dît ku kêra min di destê min de ye, yekê bi gunê xwe girtiye û li ber min çong berdaye erdê û dinale. Herduyên din jî çavên wan tu dibêjî qey dikin ji serên wan baz bidin. Sar bûne, lal bûne û li hevalê xwe yê ku xwîn ji navrana wî tê dinihêrin. Min digot qey ji bo ku heyfa hevalê xwe hilînin, ew ê li min bicivin; lê belê, wan weha nekir. Min ji tirsaxwe, hema kêrek di valahîyê de avêt wan. Min lê nihêrî ku hebekê vekîşîyan, cesaret hat min jî. Hema min got, ya Allah û ya Xwedê û min da ser piştaxwan. Revî revî revîyan. Min da ser piştaxwan. Bi dû re, ez jî ji tirsaxwe ku polîs bi me bihisin, sekinîm; min xwe hêdîka da ber dikanekê û kêra xwe ya bixwîn bi destmala xwe paqij kir û xist ber xwe. Ez ji tirsan dikira bimirama. Min digot qey herkesê ku di ber min re derbas dibe, hevalê wan e û li min digere. Gava ez ketim rê û vegeerîyam taxa xwe, hayê min jê tune bû; lê tu nabêjî çend kesan gava min kêr li wîya xistiye û daye ser piştaxwan din, ez dîtîme û tavilê li herkesî belav kiriye û xelkê ez kirime şervanekî nedîtî. Navê min tavilê hatibû guhertin û bûbû Felemezê Gunikreş!

Ez êdî bi tamamî dîn bûbûm. Ji xwe navekî min î ecêb hebû, îcar paşnavekî jê ecêbtir ji min re hatibû dîtin. Erê, min dizanîbû, ji bo mêtantîya min ji min re dibêjin; "gunikreş" lê belê yê min, min nedixwest ez bibim yekî weha ku xelk ji wî bitirsin. Ji xwe, ji berê de ji ber ku îmana wan ji min diçû, kesî li rûyê min nedinihêrî, tew îcar gava tirs jî têkeve navberê, tamam e! Weleh, me li bavê xwe zêde kir!

Çi gava ku min lingê xwe biavêta derve, kesên ku demekê gava li min dinihêrî mahdên wan ji min dixelîyan, ji bo ku silavê bidin min, ji qazî di ber min re dibihurîn, destên xwe yên rastê dibirin ser dilên xwe û serên xwe li ber min ditewandin. Lê belê, min êdî li wan jî nedinihêrî. Min dixwest ku ew ji min hez bikin, lê ji min ditirsîyan. Tew vê carê bi tamamî li dûrî min disekinîn. Vêya jî ez bêtir hêrs dikirim û hema kî dihat ber min, min bela xwe tê de dida. Vê adeta min jî dikir ku navê min bêtir belav bibe û gunikreşîya min nav bide.

Min dev ji dibistanê jî berdabû. Êdî dibistanê nema dikarîbû tişteke bidaya min. Ev mamoste jî ecêb in, ha! Çi keçikên li malê mabin hebin, hema giş dibin mamoste. Îcar tu were û ji xwe re li payebûna wan binihêre! Ne mamoste bûna, welehîn kesî bi rûyên wan de nederît jî. Ji xwe, min herroj bi wan re şer dikir. Carekê min sîleyek avêt yeka ku destê xwe li min rakir û ez ji dibistanê hatim avêtin.

Bavê min ji tirs min, nema wêrîbû dengê xwe

derxista. Min jê re got ku ez tişteki ji te naxwazim û ez ê ji xwe re kareki bibînim û bixebitim. Tişteki negot. Ji cerga ku navê min bûbû gunikreş, nema destê xwe jî li min radikir. Ev rewşa min bi kêrê wî jî dihat. Ji ber ku xelkê bi xêra min êdî bêtir xatir didayê û ew dixist şûna zilaman. Tew dêya min! Ji tirsaxwe, çigava ku ez têtetama hindur, dihat çakêtê min ji destê min digirt, sifreyek li ber min datanî, bi dû re jî mêywe dianîn. Kenê min êdî bi halê yêndora min dihat.

Ez bi vir de û wê de li kareki gerîyam. Min li xwe dananî ku ez li taxa xwe li kareki bigerim. Ji lewre ez jî çûm cîhên ku kes min nas nake. Kê ez didîtim, ji ber ku mahdê wan ji min dixelîya, tavilê ez diqewirandim. Ez ji neçarîyê, hatim taxa xwe dîsa. Min ji kê karek xwest, got qey ez henekên xwe bi wî dikim û kenîya.

Xwedîyê qexwexaneyax nêzîki mala me, gava rewşa min dît, ez xewle kirim û rê bi ber min xist. Tiştê ku wî ji min re got, ket serê min jî. Li gora ku wî ji min re got, yekî weke min êdî nikare li tu deveran bixebite û li emirê kesî guhdarî bike, an jî karê berdestê xelkê bike. Yekî wek min divê xûkîtiyê bixwe. Bacê bîstîne.

Min bi yaxwî kir. Ji ber ku tu çareya min nemabû. Kesî kar jî nedida min. Herkes ji min ditirsîya. Ne bi dilê min bûya jî, rewşa min ev bû. Divê min tişteki ji xwe re bikira.

Ez êdî derdike tim ser rêya xelkê. Ji ber ku herkesî ez nas dikirim, kesî ji min re nedigot, na. Bi taybetî jî ez derdike tim ser rêya xortik mortikên çeleng ku zarokên dewlemendan in û porê wan î jolekirî û biryantînkirî ji dûrê ve dibiriqîne, kincên wan xweşik û biha ne. Çi pereyên wan hebûna, min giş ji wan distendin. Tew êdî min ji wan re sîstemek danîbû ku her ji hefteyekê carekê, pereyan di nav xwe de bidin ser hev û li ser navê min deynin cem xwedîyê qehwexaneyê me. Ji ber ku êdî min di xwe re nedidît ku ez serê xwe bi wan re biêşînim. Carinan jî ji qicixtî ez derdike tim ser rêya wan û min sîlenin xweşik li yê ku ji nav wan herî çeleng be dixist û min bin guhên wî sor dikir. Min bi vî awayî dilê xwe lê rehet dikir.

2.

Rojekê ez sibehê zû bi xwe hisîyam. Qerisîbûm. Ev çend roj çêbûbûn ku ez neçûbûm malê jî. Ez heta êvarî digerîyam û bi dû re jî dihatim di hewşa camîyê de radike tim. Ji lewre, divîyabû berî ku mele ji bo azanê were, ez rabûma û ji hewşê derketama. Heke yekî ez bidîtama ez ê di nav alemê de rezil bûbûma. Dû re, ez ê bi çî rûyî derketama nava xelkê! Tew belkî vê carê bi temamî ji min birevîyana. Ez li ber kanîyê rûniştim û min dest û rûyê xwe şuştin. Min serê xwe şil kir û bi ava cemidî ez hebekî hatim ser hişê xwe. Ez bi dengê lingekî li xwe zîvirîm û min xwe tavilê avêt nav daran. Min

bala xwe da yê ku bi gavên giran dikeve hindurê hewşa camîyê.

Min ji kumê wî û meşa wî ew nas kir. Melê me bû ev. Navê wî Ahmed bû. Jê re digotin, Seyda. Ji cerga ku ez bi xwe dizanim, ev zilamê kal li vira bû.

Bejina wî bilind û qilafetê wî girs bû; hê li ser xwe bû jî lê westîyayî dixuya. Rûyekî wî yê girover û awirin wî yê nerm hebûn. Nûr jê dibarîya. Heta niha min nedîtiye û nebihîstiye ku tu kes jê êşîyaye.

Min bala xwe da wî. Çû li ber kanîyê rûnişt û destmêj girt. Te digot qey wê demê, ji destmêjê pê ve li tu tiştêkî din nafikire. Destmêja xwe hêdî hêdî û weke ku kêfê jê werbigire, girt û rabû ser xwe.

Heta ku ket hindurê camîyê, min lê temaşe kir. Dû re, ez derketim derve û meşîyam. Piştî bîstikekê azanê dest pê kir; dengê Seydayê Ahmed î nerm û biterbîye hat min û aramîyek bera dilê min da. Heta wê rojê, nedihat bîra min ku tu carî wek wê gavê min xwestibû ku ez li dengê azanê guhdarî bikim.

Gava ez di ber loqenteyê re derbas bûm, bêhna şorbeya ku li ser tûp dikelîya hat min û kir ku birçîbûna min were bîra min. Ez bi bêhna wê hebekî gêj bûbûm. Rabûm, ketim hindur û min şorbeyek xwast.

Pereyê min nemabû. Divîyabû min ji xwe re ji derekê perenin bidîtana. Hingî ez bi xwe bilîyabûm, min ji bîr kiribû ku ez herim pereyên xwe jî ji qehwexaneyê bînim. Xwedê kir ku di bêrîka min de,



bi qasî heqê şorbeyê hebû. Gava ez rabûm ser xwe ku pereyan bidim xwedîyê loqenteyê, zilêm ez fedîkar derxistim. Min ew nas nedikir jî camêr ji min re got,

"Te eyb kir ha, Kekê Felemez!"

Min li zilêm nihêrî. Bi temenê xwe du caran li min bû, lê ji min re digot "Keko! Tew Kekê Felemez!"

Ez şaş mabûm. Min pereyên xwe xistin bêrîka xwe û ez derketim. Dilê min bi halê kesên weke wî şewitî. Gava ez gihaştim ber dibistanê, hê derîyên wê venebûbûn. Pêjina kesî nedihat. Ez li ser kevirekî li hember derî rûniştim û min çixareyek vêxist. Ji ber dûmana çixareya min, çavên min şewitîn û sor bûn. Hê gelek hebû ku mekîneyên xwendekaran bihatana. Ez aciz dibûm. Dilê min bi min dişewitî. Vêya ez bêtir aciz dikirim. Min bi hêrs çixareya xwe dieciqand û dikişand û diponijîm. Ez ne li ser hişê xwe bûm.

Ez bi dengê mînîbusê bi xwe hisîyam. Heyecanekê xwe li dilê min rapêça. Min xwe tavilê da ser hev û ez rabûm ser xwe.

Min çavên xwe bera ser cama mînîbusa ku dihat dan. Gava min ew dît, çavên min biriqîn, kêfa min hat. Min lê nihêrî. Nihêrî... Mînîbus di ber min re bihurî û di derîyê paşîyê yê mektebê re ket hewşê û sekinî.

Min di nav hesinên li ser dîwêr re, bala xwe da kesên ku dadiketin. Dû re, min dît ku keçika min a

esmer û bedew, weke şahbanûyekê bi kubarî daket û li dora xwe nihêrî. Wê gavê, min got qey ew ê çav li min bikeve û li min hay bibe. Ez tirsîyam.

Min jê hez dikir. Çi gava ku çav lê biketama, min digot qey hin min ji paşîyê de, ber bi wê ve dahf didin. Min xwe bi zorê digirt. Her deverên min pûç dibûn û ez ji ser hişê xwe ve diçûm.

Heta ku ew daket, bi bişirandineke kubar silav da hevalên xwe û ber bi mektebê ve meşîya jî min li wê temaşe kir. Her hereketeke wê dikir ku ez bêtir bi wê ve bême girêdan û bi vî awayî, ew jî ji min bi dûr bikeve.

Xuya bû ku di nav hevalên wê de, gelekî jê dihat hezkirin. Weke qralîçeyekê dibişirî û bersiva silavên wan dida.

Ez ji nişka ve, li tiştêkî din fikirîm. Le ku hinên din jî dil dabin vê keçikê? Le ku keçik jî meyildarî yekî ji wan be? Wê gavê, ez ê çî bikim? Wê gavê, ez ê çî gûyî bixwim? Hema min dît ku kulmên min ji hêrsan jidîyane. Niha kî derketa hemberî min, min ê kulmên xwe wek balyozan li ser çavên wan bixistana; min ê dev li canên wan bikira û min ê bikira ku perçeyên wan ên herî mezin jî guhên wan bûna!

Heta ku ew ket hindur û wenda bû jî min lê nihêrî. Dû re, ez di cihê de hêdîka zîvirîm û beyî hemdê xwe meşîyam. Digel ku hayê keçikê ji min tune bû jî min digot qey hayê wê ji min heye û ew jî niha li min difikire. Belkî aniha di pencereyê re bala xwe

daye min jî. Ez bi wê hêvîyê li xwe zîvirîm û min serê xwe rakir, li pencereyan nihêrî. Kesek nedixuya.

Di jîyana xwe de, ev cara duyem bû ku min weha dil dida keçikekê. Cara pêşîyê dilê min dîsa ketibû keçikeke weha xweşik. Bi rojan, bi mehan, min dev ji her tiştî berdabû û karê min her ew bû ku heta êvarî min xwe dida bende û çî gava ew derketa derve, min dida pey wê. Carinan weha dibû ku min nema xwe radigirt û min digot ez ê herim pê re bipeyivim. Lê min baş dizanîbû, heke min jê re bigota, mahdê wê dê ji min bixelîya û ez ê perîşantir bûbûma.

Heta roja ku ji taxa me bar kir jî em nepeyivîn. Roja ku bar dikir, ez li serê kuçeyê sekinîbûm û min li wê dinihêrî. Gava li mekîneyê siwar bû û di ber min re bihurî, li min nihêrî û bişirî. Qey fahm kiribû ku ez ji wê hez dikim.

Êvaran gava ku dihat bîra min ez derdiketim kuçeyê û çî derîyê ku dihat ber min, min pehîna xwe lê dixist û ez diqêrîyam. Herkesê pê dizanîbû bê ez ji bo çî ketime vê rewşê; lê kesê cesaret nedikir bihata bi min re bipeyivîya. Min çî dixwest ku hinan ji min bipirsîya û min ji wan re derdê dilê xwe bigota. Lê ew ji min ditirsîyan. Dilê wan jî di ber re bi min dişewitî. Carinan min didît, hin pîrekan gava min pehîn li derîyan dixistin û ez diqêrîyam, di pencereyan re li min dinihêrî û bi halê min digirîyan.

Wê gavê, ez bêtir li ber xwe diketim û hêrs dibûm.  
Ez diçûm ber pencereya wan û min kevir diavêtin  
wan, da ku li min nenihêrin.

Heta ku ez li vêya rast hatim jî ji bandora evîna xwe  
ya berê xelas nebûm. Ez dîn bûbûm. Ji ber ku nêzîkî  
mala me bû, ez hema dihatim ber derîyê vê mektebê  
û min bela xwe di zarokan dida. Kî di derî re  
derketa, min li çavên wan dinihêrî û ez ji bo şer li  
wan li hemanan bûm. Çavên min bar nedibûn.  
Hesûdîyeke xurt bi min re peyda bûbû. Him gelek ji  
wan çeleng bûn, him jî çî keçikên bedew hebûna giş  
bi wan re digerîyan. Vê hesûdîya ha, ez bêtir ber bi  
dijminatîyê ve dibirim.

Rojekê dîsa ez li ber derî sekinîbûm û min ji xwe re  
li wan temaşe dikir. Çend kesan ji xwe re bi topê  
dilîst. Qralîçeya min jî ketibû milê hevaleke xwe û  
di hewşê de digerîya. Wê gavê min dît ku kesên bi  
topê dilîst, ber bi hev de hatine û dikin şer bikin. Tu  
nabêjî, yekî wek qerasekî, xwe li yekî piçûk  
radikişîne. Weleh, min dît ku vîya sîleyek avêt  
lêwik; hema min xwe negirt û ez ketim hewşa  
mektebê. Min xwe gihand wan û lawikê piçûk avêt  
paş xwe. Min yek bi ser devê vîya de vekir ku heta  
ew hebe, ew ê wê derba min ji bîr neke. Got "terep"  
û li erdê ket. Piştî wê navê min bêtir belav bû û ez li  
nav xwendekaran jî navdar bûm. Lê belê, bi navekî  
din. Êdî kê ez didîtim, ji min re digot "Felemez  
Abî". Kesek pê nizane, bê kêfa min çî qasî ji vî navî

re dihat!

Min nema dikarîbû îdare bikira. Ez ê bi vêya re bipeyivîyama. Min dizanîbû ku keçik min qebûl nake jî ez ê bi wê re bipeyivîyama. Ez ê sor bibûma, lal bibûma, devê min ê negerîya, ez ê biricifîyama, belkî bêhna min jî biçikîya... Belkî keçikê henekên xwe jî bi min bikirana û bi min re bixeyidîya jî...

Dîsa jî ez ê pê re bipeyivîyama.

Ez çûm û hatim. Min xwe da benda zîlê. Sebra min nemabû. Tu rêyên din nebûn. Ez ê pê re bipeyivîyama. Ji niha de, ez diricifîm...

3.

Ro dihate nîvro. Ez li benda dengê zingilê bûm ku xwendekar derkevin derve. Hê bîst deqîqe hebûn jî min lê nihêrî ku keçika min bi keçikek din re derket derve. Çavên xwe li derve digerandin. Qey li bende hinan bûn, an jî hayê wan ji hinan hebû. Ma gelo ez bûm ew? Na lo! Ji xwe, gava çavên xwe digerandin, keçika hevala wê li min hay bûbû û mîna ku hebekî tirsîyabe, tiştin di guhê keçikê de gotibûn. Wê jî li min nihêrîbû, lê mîna ku ji hebûna min a li wira aciz bûbe... Min tavilê berê xwe guhert û ez bi şûn ve kişîyam.

Weleh, min dît ku bişirandinekê xwe li rûyê herdu keçikan girt. Tu nabêjî, hayê wan ji hinên din hene. Min jî li alîyê ku wan lê dinihêrî, nihêrî. Teqsîyeke reş hat û li ber dîwêr sekinî. Zilamekî ciwan ku berçavkeke reş ya rojê di çavê wî de bû, daket û bi

ken ber bi dîwêr ve meşîya. Bi destên hevdu girt û silav dan hev. Keçikê tiştin ji wî re got û li alîyê min nihêrî. Bi dû re, wî zîlamî jî li alîyê min nihêrî. Min fahm kir ku ew li ser min dipeyivin. Lê belê, çi têkîlîya min bi wan re heye?

Weleh, hema min dît ku zilêm dev ji wan berda û ber bi min ve meşîya. Bejina wî dirêj û qilafetê wî jî girs bû; lê çavê min di wî de dibirî. Heke min bixwesta, min dikarîbû ew bi derbekê re li erdê rast jî bikira. Lê min dixwest ez hîn bibim, bê hela derdê wî çi ye. Ez fahm bikim.

Hat û li ber min sekinî. Di vê zivistanê de û berçavka rojê? Li rûyê wî nedikir. Ji bo ku ez henekên xwe bi wî bikim, ev mahneyeke baş bû. Lê belê, min dît ku zîlamê me qure derket.

Got; "Me bihîst ku tu pir li van doran digêrî. Bila hayê te ji te hebe. Tu bela xwe di keçik meçikên hevalên min bidî, ez ê lingên te bişikînim."

Heylo! Hela tu ji xwe re li vî halî binere, lo! Lawik hatiye û fortan li min dike. Mêr e, weleh! Hema min got "qereb" û min serê xwe di nav çavên wî de ve kir. Zîlam wek darekê ji kokê de hejîya.

Bavo! Tu nabêjî lawê min ne bi tenê ye. Te dît, derîyên teqşîyê vebûn û çend zîlamên weke qeraseyan jê daketin û ber bi me de baz dan. Divê ez birevîyama. Min li wan nihêrî. Sê kes bûn. Qeweta min têra wan nedikir. Gava min dît ku herdu keçikan jî ji ser dîwêr bala xwe daye me, hema min got,

heyfa mêtantîyê ku ez ji ber vana birevim.  
Sê heb bûn. Ma min ê çawa bikira? Hersê jî li min civîyan. Di nav re min jî çend heb avêtin wan, lê belê kûçikbavan xweş şer dikir û ji min xurttir bûn. Gava yê erdê jî rabû, êdî min fahm kir ku rewşa min ne tu rewş e.

Heke mirov rastîyê bixwaze, ev ne şerê mêran bû. Ma mirov bi çar kesan li yekî dicive? Hela ew ne mêt bûn; ez nizanim kê nîhabû min ku ez ji wira nerevîyam û li ber wan sekinîm.

Tu devera min ku derb lê neket nemabû. Min nema ber xwe didît. Ez bi her derbekê re, bi alîyekî de xwar dibûm. Kulm, pehîn, enîşk, çong...

Diyaxwenîhano, tu nemabû ku bi qûna xwe jî li min bixin!

Di serî de, laşê min diêşîya, lê bi dû re ew jî nema. Min derb dixwar û ez di nav wan de xwarî erdê dibûm jî dev ji min bernedida. Heta ku dengê azanê hat min jî wan her li min xist. Ev jî tê wê mahneyê ku min bi qasî deh deqîqeyan lêxistin ji wan xwariye û hê jî dev ji min bernedaye. Ev rekorek e, ha!

Dengê Seydayê Ehmed, mîna ku hatibû hawara min, li wê dorê vedida. Min dît ku ez ji destê wan xelas bûme. Êdî min ji jora xanîyan, li wan temaşe dikir. Ez li ezmanan bûm. Lê wan hê jî li yekî dixist. Yek di nav wan de xwarî erdê bûbû û ji her derê wî xwîn diherikî jî wan dev ji wî bernedida. Ji xwe yê li erdê bû jî nema tev dilivîya.

Nesîb

Îbrahîm Seydo Aydođan: ibrahimseydo@ixir.com

1.

Got, dinya bi teqûreq e. Dewran e. Bi dorê ye.

Rojekê dikenîne, rojekê digirîne. Lê Mîr Îzedîn tu carî negiriyabû.

Ji bilî mirina dê û bavê xwe...

Piştî mirina bêv, bûbû serokeşîr. Dewlemend bû. Ji xwe re qesir û qonak dabûn avakirin.

Heta bi do jî ji sibeha Xwedê û heta bi êvaran, heta ku tariyê mîna dinyayê binixumîne xwe li dora wan digirt û şer bi wî awayî disekinî, şûr û mertal li hev diketin û di destên Mîr Îzedîn û şervanên wî de li ser serê xelk û alemê dibûn xezeb...

Wan tişt di dinyayê de nehişt. Tişt di kesî de nehişt. Mirov digot qey Mîr Îzedîn ji dinyayê heyfa xwe hildianî; li jiyana û qederê hatibû xezebê... Heta bi do jî mirov digot qey Mîr Îzedîn tev li tiştên heyî, li yê tuneyî jî hatibû xezebê.

Hingê ji bo aşkirinê, xelkê ji zarokên xwe re digot, "Binere, ez ê te biavêjim ber pêhlewana Mîr Îzedîn, ha!"

Xortikên nûgihîştî jî her û her dilên xwe dibijandin wan û ji xwe re digot, "Xwedêyo, hema rojekê ez jî bibim pêhlewana Mîr Îzedîn, ez jê pê ve tişteki din naxwazim..."

Gava ku pesinê yekî xurt dihate dayin, li ser wî weha dihate gotin. "Çi zilameki xurt û şervaneki bêhempa,



eynî mîna pêhlewanên Mîr Îzedîn e."

Mîr Îzedîn û pêhlewanên xwe, bi dinyayê ve ketibûn. Temamê welatan dabûn ber xwe. Lê îro şer nemabû. Eşîrên neyar ji wan re qasid şandibûn. Herkesî mezintîya wî dipejirand... Qasidan xwe avêtibû dextlê mîr û galegalên begên xwe radigihandinê.

Begên wan digot "bes e, heyran... em nema dikarin bi we... ji ber vî şerî, mêr di malan de neman, bes e... em heta bi niha jî ji ya xwe daneketin û me got na. Lê êdî bes e. Em ji ya xwe dadikevin. We got çî, bila weke we be... Hûn çî şertî deynin ber me, li ser çavan û li ser seran... hûn mezin... hûn xurt... em kûçikên ber deriyê we... ka bes e, heyran... tişt di me de nema, bes e... em xwe diavêjin bextê we... li me werin rehmê... bes e..."

Di hemû şeran de bi ser ketin. Tu eşîran nema dikarîbû xwe li ber wan bigirta. Peyayên Mîr Îzedîn, di qadên şer de dibûn şêr. Dibûn pêhlewan û dadiketin nava zilaman.

Êdî hingî ew qasî xurt bûbûn, Mîr Îzedîn jî ji vê hêza xwe tirsîya.

Herder ketibû bin emirê wî. Hemû kes dibûn zilamên wî.

Çî beg, çî mîr, paşe, siltan...

Ji çar aliyan, herro duro qasid dihatin û digot:

"Em giş kûçikên te nin. Tu me dikujî, tu me diavêjî, em yên te nin... bibêje herin xwe bikujin, em ê

herin... bibêje, dinyayê xera bikin, em ê bikin... tu  
berê me bi ku ve bikî, em ê herin, canên me, serên  
me û şûrên me di oxira te de nin..."

Mîr Îzedîn bala xwe dida van gotinan.

Fikirî. Her ku li xwe fikirî, bêtir tirsiya...

Got; "Ma qey ez ê xwe bikim şîrîkê Xwedê?"

Tirsiya.

Ji hertiştî sar bû, xeyidî... Her ponijî. Dinya li ber  
çavên wî reş bû.

Ji civatan reviya. Bi tena serê xwe ma...

Êvaran li hespê xwe siwar bû û bi çolê ket.

Heta sibehan nehat.

Gava dihat jî mirûz didaliqiya.

Bi ku de biçûya jî vê fikirê dev jê bernedida.

Çû ku, ew jî bi xwe re bir...

Xelkê got; "Mîr Îzedin nexweş e."

Got; "Derdekî wî heye, nabêje..."

Mîr Îzedîn...

Zilamekî xurt... Şervanekî bêpayan... Şêrekî qadên

şeran.... Şûr û mertal xemla destan... Qilafetê wî

girs. Gavên wî xurt ku erd ji ber dihejiya. Çav kûr.

Nerînên wî dûr. Kêmaxêv.

Êdî bûbû mîrê dinyayê.

Mîrê demsalan, kulîlkan, teyr û tilûran...

Mîrê mîran, çar aliyan... bayan... baranan...

deryayan... erdan... çolan... çiyayan. Jiyanan...

Mîrê zindiyên û miriyan... herdu aliyan... çûyin û

hatinan... zayinan...

Destê xwe biavêta çî, dibû ya wî. Bi peyveke wî, eşîr ji hev belav dibûn, an bi hev diketin... Mêran dev ji jinan berdida... Gur dadiketin ji çiyayan. Mar derdiketin ji qulan. Teyran li ser dengê wî, xwe nedigirt li ezmanan...

Berê xwe bidaya çiyayan, çiyayan li ber wî, xwe berdida ser çongan...

Fikirî... Got; "Ma min xêr e? Ez çîma ew qasî mezin bûmim? Ma qey ez bûmim şîrîkê Xwedê?" Temenê wî hê nebûye çîl. Rîhspiyan kiribû û nekiribû, pîrekek ji xwe re nekiribû jin, neketibû rezê evînan, himbêza jinan, paxila yaran...

Digot; "Na..."

Serê xwe, tu bibêjî carekê jî danenîbû ser sîngan... devê xwe nexistibû tu cotê memikan... Bûbû mîrê xewnan, stranan, êvaran, bitenêtiyan...

Navê wî bûbû destan û belav bûbû li hemû welatan...

Gava devê xwe vedikir, hey digot; "Nesîb".

Digot; "Min xewnek dîtiye, nesîbê min ne li vira ye..."

Gişan bala xwe didayê. Yên ku bihîst, ji yên ku nebihîst re digot. Kesî tiştê ji van gotinên ku mîr kiribûn fahm nedikir. Yên ku fahm kir jî tirsiyan ku ji xelkê re bibêjin. Ji tiştê ku fahm kiriye, tirsiyan. Rojekê hat û rîhspî dîsa li dorê civiyan. Mîr û beg û siltan li dorê geriyan. Xwe avêt ber lingên hespê wî. Jinên xwe dan oxira wî. Şervanan şûrên xwe anîn, li ser çongan serên xwe tewandin û li ber danîn.

Got; "Weke hercar em di oxira te de nin..."

Mîr Îzedîn got; "Na..."

Got; "Ez ê ji van deveran herim... nesîbê min ne li vira ye, ez ê lê bigerim..."

Began, mîran, siltanan xwe avêt wî. Li ber geriyan.

Giriyan... Gişan bi hev re got:

"Na gidî! Li me weha neke, heyran. Dev ji me bernede û neçe tu deveran. Li ser çûyina te, dê dest pê bikin dîsa şer li qadan. Dê bibe hawara jinan; dê birîn vebin di laşên simbêlqeytan û li erdê biherike xwîna mêran."

Rihspiyan, şêxan û ûcaxan canên xwe dan ber kêran. Dane girî. Hemûyan bi hevdu re kir qêrîn. Xwe avêt ber lingên wî û got.

"Nebûna te, bi mirina me ye. Em ketinin dexlê te, neçe. Bêyî te, tune ye tahma herdu dinyayan, dîtina çavan û tepîna dilan. Neçe, dev ji me bernede..."

Mîr Îzedîn got; "Na..."

Got; "Ez ê herim. Ez lê dinerim ku ez bûmim şîrîkê Xwedê. Ez ji ber diêşim. Ez Mîr Îzedîn im, lê ez bi xwe jî ji vî navê xwe ditirsim..."

Xelkê got; "Jiyan beyî te heram e, neçe."

Wî got; "Jiyan çemekî xurt e, beyî min jî diherike, ez diherim. Mirin û hezkirin û zayîn beyî min jî dibin, ez diherim. Ba beyî min jî dê bên ji ezmanan, baran beyî min jî dê bibarin ji ewran. Kulîlk dê bibişkivin dîsa serê biharan, li qiraxa çeman û li kêleka rîyan; çivîk û teyr û tilûr dê baskên xwe kil bikin û bifirin.

Demsal dê bidin pey hev, dorê ji hev bistînin. Sal dê beyî min jî derbas bibin weke hemû salan. Ev giş karê Xwedê nin, ne yên min in. Dev ji min berdin.

Ka bihêlin, ez diherim, heyran..."

Gişan serên xwe bera ber xwe dan. Giş giriyan.

Mîr Îzedîn got; "We xwe avêt bextê min, ez ê jî xwe biavêjim bextê Xwedê. Min xewnek dîtiye. Nesîbê min li ser rêyê ye. Hespê dilê min germ bûye. Ez ê bidim pey nesîbê xwe, belkî li çiyayî ye, li çolê ye, li nava ûmmanê ye. Heta ku ez bibînim û bi dest bixim, ez ê bidim pey. Tew belkî ne li tu deveran e..."

Got; "Hûn jî xwe bidin ser hev û berên xwe bidin Xwedê... Ez diçim, bi xatirê we... Heqê xwe helal bikin. Rê li ber min e, wey li minê... Yê ku diçe, dibe ku neyê..."

Pîrekan li xwe xist. Keçikên xama zewac li xwe heram kir...

Mêr giriyan Şêr û piling ji kerban qêriyan. Şervanan şûrên xwe qurifandin û avêtin binê newalan. Dar şikiyan. Ba westiyan. Baran bariya...

Li hespê xwe siwar bû û çû.

Berê xwe neda tu deveran. Hespê wî bi ku de biçûya...

Gund li dû xwe hiştin. Çem û çiya û çol û newal...

Welat li dû xwe hiştin.

Teyrên ku hevaltîya wî ya rê dikir, kir û nekir, ew qane nekir. Giriyan û vegeyriyan.

Hinan ji wan baskên xwe şikenandin û nema firîyan...

Hinan ji wan nema kir vîçevîç û her nalîyan.

Xelkên ku dibihîst, derdiketin ser rêya wî.

Ew li kesî nese kinî. Guh neda tu gotinan. Li dengê tu giriyan ho veneda.

Venegeriya.

Çû...

2.

Bi şev û bi roj. Heyvê û rojê belkî sed carî dor stend ji hevdu.

Ba û baran... Pûk û berf... Tofan û xezeb.

Nese kinî.

Heta ku ew jî û hespê wî jî li qiraxa çemekî westiyan...

Tev hespê xwe da nav çêm. Xwe şuşt. Ecêba qilêrê jê çû. Paqij bû. Xwe zuha kir û li ber tavê dirêj kir.

Hespê wî xwe jê re kir sî. Hingê westiyabû, piştî şuştinê jî canê wî sisttir bûbû. Çavên wî çûn ser hev.

Raket.

Çend rojan weha mabû? Belkî hefte, belkî meh û belkî jî sal di ser re derbas bûn.

Bi dangan bi xwe hisiya. Dengên lingên hespan bû.

Çargavî. Dûr bûn, lê erd dihejand.

Rabû û li dora xwe nerî. Guhdarî kir. Berê xwe da girekî û sekinî.

Deng ji paş wî girî dihat.

Rabû, hêdîka meşiya û çû. Derket ser gir û rûnişt.

Bi qasî panzdeh, bîst zilaman bûn. Ketibûn nav hev.  
Şûrên xwe bilind dikirin û bi hespên xwe çargavî li  
dora hev diçûn û dihatin.

Şer bû.

Bala xwe da wan.

Piştî demekê têgihîşt. Hemû kesên ku li wê qadê  
bûn, li yekî civiyabûn.

Li mirovê bitenê nerî.

Dilê wî debar nekir. Bi xwe zor anî.

Diranên xwe ji hêrsan jidandin. Diranên wî di hev re  
çûn. Agir ji awirên wî diçûrisî. Tû erdê kir.

Gulokeke xwîne li erdê ket.

Siwar bû. Şûrê xwe kişand û nihêrî. Hespê xwe  
bezand. Berê xwe da wan.

Daket qadê. Beziya wan.

Şervanê ku neyar lê civiyabûn, lê hay bû. Çi qasî  
bala xwe dayê jî ew nas nekir.

Got; "Lawo, ev kî ye, weha bê serî tê?"

Mîr Îzedîn şûrê xwe rakir û hat. Şewqa şûrî da çavên  
wan. Gihîşt kê, li erdê rast kir. Erd dihejiya di bin  
lingên hespê wî de. Agir ji ber derbên şûrê wî diçû.  
Kes nehişt. Ji wî zilamê ku bi tena serê xwe ketibû  
nav ew qas zilamî pê ve...

Zilêm lê nerî. Tê dernexist. Nas nekir.

Got; "Ey mêrxasê delal, camêrê biyanî. Navê xwe  
kerem bike, ez te nas bikim. Van qadan hê şervanekî  
mîna te nedîtiye. Ka bibêje, tu kî yî?"

Mîr Îzedîn lê sekinî. Xwêdana eniya xwe bi pişta

destan paqij kir. Şûrê xwe xist kalên. Bala xwe dayê.  
Bêhna wî hebekî hatibû ber wî.

Xwe bi xwe fikirî.

Got; "Bi Xwedê, heke ez navê xwe ji vî zilamî re bibêjim, nabe. Min nas neke, çêtir e. Niha navê min hatiye heta van deran jî. Hela ez ê xwe nedim naskirin, bê çi dibe."

Got; "Navê min Mihemed e. Ez rêwiyek im. Evdekî Xwedê mim. Ez bi pey nesîbê xwe ketimim."

Zilêm got; "Ser çavan, ey mêvanê delal. Lê tu ji ku yî? Ji kîjan eşîrê yî? Ji ku tê û diçî ku?"

Mîr Îzedîn got; "Ez ne ji tu deveran im. Eşîra min nîne. Ez ne dizanim bê ez ji ku tê û ne jî diçim kî derê."

Zilêm tişt ji gotinên wî fahm nekir. Têgihîşt ku naxwaze xwe eşkere bike. Belkî ji hinan reviyaye. Ma şervanekî mîna wî, dê ji kê bireve? Neket serê wî.

Lê bi ser de neçû.

Ji xwe re got; "Kî be jî bila be. Hat alî min û ez ji mirinê xelas kirim. Divê ez jî wî biezibînim, bikim mêvanê xwe û bi çi awayî be jî xwe ji bin vê minetê xelas bikim."

Mîr Îzedîn got; "Ma xêr bû? Tu bi tena serê xwe ketibû nav ew qas zilamî. Ma qey kesekî te nîne? Merivek? Xwediyek?"

Zilêm got; "Belê henin, birayê ezîz. Ma çawa? Lê şer ne şerê eşîran e. Şer şerê şexsê min e û min



nehiştiye kes were alî min."

Mîr bala xwe dayê. Zilamekî girs. Cênîkên wî spî bûnin. Ruyê wî fireh. Awirên wî kûr. Simbêlên wî boq.

Li ser hespekî gewrî boz. Bi xwe bawer. Dengê wî xurt. Kubar.

Di şerekî şexsî de... Hingî mêr e, bi tena serê xwe xwe di bîst zilaman de derdixîne.

Ji xwe re got, "ev ne zilamekî ji rêzê ye."

Zilêm got; "Ey şervanê delal. Tu xwe eşkere nakî, lê dîsa jî ser çavan. Te ez ji mirinê xelas kirim û kirim deyndarê xwe, xistim bin mineta xwe. Kerem bike, bibe mêvanê min. Belkî tiştê ku tu lê digerî di destê me de hebe."

Mîr Îzedîn negot, na. Xwe da tengala wî û pê re çû. Bû mêvanê wî.

3.

Qesireke mêrik a bilind li ser girekî hebû. Mezin û bedew bû.

Begê wan deveran bû. Hê hespê wî ji dûr ve ber bi çavan ket, xelk û alem li dorê civiyan. Bi qedr û qîmet, heta ber devê qesirê jî da peşiya hespê wî. Li hewşa qesirê jî peyayên wî li bende bûn. Heryek mîna pêhlewaneke.

Mîr Îzedîn got; "Welleh, min rast pê derxistiye. Ev zilamekî esîl e."

Nan ji wan re hat çêkirin. Beran hatin serjêkirin.

Him ji bo vegera Beg, him ji bo mêvên... Mêvanê ku

digel biyanîbûna xwe, çûbû Beg ji mirinê xelas kiribû.

Heta êvarî xelk li wan civiyan.

Piştî ku herkes belav bû û bi tena serê xwe man, Mîr pirsî:

"Begê min, ka tu nabêjî bê sedema şerê we çi bû?"

Beg keserek kişand.

Got; "Mêvanê delal, em Beg in. Ez nizanim, ka tu çi qasî bi began dizanî. Gava yekî xwe li şexsê begekî rakişand û şûr lê kişand, divê beg bi xwe derkeve hemberî wî."

Mîr weke ku bipirse, got, "Lê belê, şerê we ne mîna şerê şexsan bû."

Beg got; "Gava tu çû qada şerî, tu nizanî bê dê çi were serê te. Tu xwe diavêjî mêrantiya neyêr. Yek derkeve, tu ê bi yekî re şer bikî. Deh derkeve bi dehan re. Gava neyarê te ne mêr be, carinan bîst zilam jî derdikevin pêşiya mirovî. Tu û şensê xwe!"

Mîr pirsî: "Ma çi ji te dixwazin?"

Beg serê xwe hejand. Qey gava ku dihat bîrê, dilê wî diêşiya. Di ber xwe de keniya. Ne kenekî ji dil bû.

Kenekî ji kerban...

Got, "Ew dixwazin min rakin û li dewsa min rûnin."

Got; "Begîtî û axatî ne xema min in. Lê îro ez vê xwesteka wan qebûl bikim, sibehê dê dest biavêjin jinên me jî. Min gotiye, kî bikaribe di şer de zora min bibe, qesir û qonax, hemû dewlemendî û begîtiya min li wî helal be."

Mîr got; "Te xweş gotiye. Saeta te xweş be!"

Beg got; "Erê min got. Camêran got, heta ku em zora hevdu bibin, em ê her sibehê werin qadê. Min got, heke ez ê têk biçim, bila ne li ber çavên mirovên min be. Ez bi tena serê xwe çûm. Rojên ewilî, yeko yeko hatin. Min ew têk birin. Bi dû re dudo dudo hatin, min zora wan bir. Rojên din bûn sisê, bûn çar, bûn deh û vaye îro jî te bi xwe dît, bûbûn bîst."

Mîr got, "Ê ma tu çima peyayên xwe bi xwe re nabî? Bila nekevin şer, bila li wira bin. Çi gava ku neheqiyek li te hat kirin, ji bo ku ew jî beşdarî şer bibin."

Beg got; "Ê ma ne min got, ez naxwazim li ber çavên mirovên xwe bikevim erdê. Heçî zilamên min, hê bi çavên serê xwe nedîtiye ku piştta min hatiye erdê. Ew dibêjin, qey ez weha li ser lingan û şûr di dest de ji dêya xwe bûme. Ji min re jî bûye inyard êdî. Çend heban werînin jî divê ez xwe ji ber wan nedime alî. Lê ez jî mirovek im û êdî dest û milên min ne bi qasî berê xurt in. Qeweta min mîna te nagihîje bîst zilaman."

Mîr heq da wî. Lê di dilê xwe de jî nalet li mêrantiya begên neyar û neheqiya ku li wî dikin anî. Vêya Beg di çavên wî de mezintir kir û xatir dayê.

Piştî ku li qesirê geriyan û westiyan, mîr çû odeya ji bo wî hatibû amadekirin ku deh celeb xwarin, her celeb fêkî lê hatibû danîn. Demeke dirêj xew neket çavên wî. Nîzanîbû, bê kengî di xew re çû.

Sibehê, gava bi xwe hisiya, hê Beg ranebûbû. Ji zilamên wî re got ku bila kes Beg şiyar neke. Zilaman fahm nekir. Gava mîr ya dilê xwe ji wan re got, serên xwe bera ber xwe dan.

Mîr xwe amade kir, şûrê xwe derxist, paqij kir û dîsa xist kalên. Çefîyek li serê xwe gerand ku bi tenê çavên wî xuya dibûn û berê xwe da qada şer.

Li wira bi qasî eşîrekê zilam hebûn. Piştî ku hayê wan ji şerê roja din çêbûbû, çi zilamên wan hebin, giş dabûn ser hev. Hayê wan jê nebûbû ku yekî din hatiye beg xelas kiriye. Ji ber ku çi kesên do hatibûn şer hebin, giş miribûn.

Mîr ji dûranê li wan nerî. Wan jî li wî. Wan tê dernexist ku yekî din ketiye şûna beg.

Şûrên xwe kişandin, ber bi jorê ve bilind kirin. Lingên xwe li zikên hespên xwe xistin û bi ser wî de hatin. Qada şer di bin lingên hespan de hejiya. Erd di bin nalan de qelişî.

Mîr jî şûrê xwe kişand û hespê xwe çargavî bezand. Gava yên hember wî dît ku ji ber wan nareve, di nav xwe de got, "Mirina wî hatiye, tê ser mirina xwe." Yekî ji wan got, "Ev dîn e." Yê din got; "Bêhişekî dera hanê ye." Yekî din got; "Qey çavên viya ji tişteki natirsin, kuro!" Yê din got; "Bitirse jî netirse jî ew ê îroj bê kuştin." Yekî din got, "Em pêncî mêr in. Ma qey nikare bi me gişan!"

Pêncî mêr û zilamek.

Mîr Îzedîn.

Heke bizanîbûna ku ew e, qey niha wan navê wî bihîstiye, her yek dê bi aliyekî de bireviya.

Wan nizanîbû. Hayê wan jê tune bû. Yên ku ji ber destê wî filitîn, dê bi dû re pê bihisiyana bê çî hatiye serê wan û dê ji xwe re bigota; "Wey! Xwelî li serê me be, tew em jî mêr bûn û me şûrên xwe li Mîr Îzedînê şêrê şeran kişandin!"

Gava beg, bi xwe hisiya, bi ser zilamên xwe de qêriya.

Got, "Hey kerno! Xwedê li we bixe! Top li we bikeve! We ez rezîl kirim. Neyarên min dê bibêjin beg ji me tirsiya, ji şer reviya, nehat qadê. Ma ne ez ji we re dizanim! We çima ez şiyar nekirim?"

Gava zilaman jê re got ku mêvanê wî xwestiye weha bibe û ji dêleva wî xwe girêdaye û çûye qadê, hişê beg ji serî çû.

Got; "Ev çî zilam e, ji bo Xwedê?"

Lê heyirî.

Debar nekir.

Got; "Xwelî li serê we be ku we ez şiyar nekirim, we çawa hişt ew bi tena serê xwe here? Le ku niha miribe û ez negihêjim ser?"

Zû bi zû hespê xwe da amadekirin. Rahişt şûrê xwe û berê xwe da qadê.

Hê nû ji deriyê qesirê derketibû, dît ku vaye mêvanê wî li ser hespê xwe xwe kil dike û ji wê de tê.

Sekinî.

Heke weha be, mêvên dîsa zora dijminên wî biriye.

Mîr gihaşt cem wî û lêborîn jê xwest.

Got; "Neheqiyek li te dihat kirin. Dilê min debar nekir."

Beg ji hespê xwe daket. Mîr jî daket. Hevdu hembêz kir.

Gava berên xwe dan deriyê qesirê, zilaman bala wan kişand ser ecêba toza ku ji wî aliyê tê.

Qey hinan dabû ser pişta Mîr.

Beg gava dît ku neyaran girtiye ser qesira wî, di dilê xwe de got, "Vana lingên xwe zêde radan" û emir da zilamên xwe."

Zilaman şûrên xwe kişandin. Mîr Îzedîn û Beg jî şûrên xwe kişandin û li pêşiya wan sekinîn. Kesên ku dihatin destvala bûn. Bi tenê di destê yekê de şûrek hebû. Ew jî serokê wan bû. Yê ku dixwest di dewsa wî de bibe Beg.

Eşîra xwe dabû dû xwe û hatibû.

Xwe avêt lingên Beg.

Got; "Me fahm kir, em nikarin bi te."

Şûrê xwe hêdîka danî ber lingên wî û serê xwe tewand.

Got; "Van qadan şervanekî mîna te nedîtiye û ew ê nebînin jî. Serê min di oxira te de ye. Kerem bike. Jê bike."

Mîr û Beg li hev nerî. Bi dizîka bi hev re kenyan...

Êvarî, Mîr xwe bi Beg ve da naskirin û navê xwe yê

esil jê re got. Beg ewilî bawer nekir. Şaş bû. Rabû û xwe avêt lingên wî.

Got, "Tu me bibexişîne, mîrê min. Te ji me re negot û me jî nizanîbû. Me pesinê te bihîstibû, lê hê me tu nedîtibûyî. Me tê dernexist. Lê divê me bizanîbûya ku ji Mîr Îzedînê şêrê şeran pê ve kes nikare bi pêncî zilamî. Divê min tu ji şûrê te nas bikirayî. Divê min tu ji dilê te nas bikirayî..."

Mîr keniya, nehişt ku Beg xwe li ber wî bitewîne. Ew hembêz kir.

Roja din, Mîr xatir ji wan xwast.

Beg çî qasî li ber geriya jî nema.

Got; "Heyran, min xewnek dîtiye. Behsa nesîbê min dikir. Min daye pey wê xewnê. Ez li nesîbê xwe digirim. Min negirin, divê ez herim..."

Tu kî yî...

Îbrahîm Seydo Aydoğan: [ibrahimseydo@ixir.com](mailto:ibrahimseydo@ixir.com)

1.

Rojekê zilamekî kal hat û li ber dîwarekî rawestîya.

Li ser tutikan rûnişt. Herdu destên xwe dan ber rûyê xwe û dest ponijandinê kir. Bîstikekê weha kûr fikirî û pê re serê xwe bi xemgînî kil kir. Dû re, destên xwe di kêleka çongên xwe re bera xwarê dan. Bi vî awayî bêhna xwe berda.

Xuya bû ku ji rêyeke gelek dûr dihat. Çavên wî hê li rêyê bûn.

Xortekî nûgihîştî... Temenê wî çardeh... Bejin zirav.... Çavên wî gir û reş. Rûyê wî xweşik.

Westîyayî. Xwe da kêleka kalo û rûnişt.  
Çavên kalo li rêyê. Çavên lêwik li kalo...  
Kalo rabû, li dora xwe niherî.  
Lawik jî rabû.  
Der û doreke fireh. Bêsînor. Ji dûranê ve, çîyayên bi  
heybet xuya dibûn. Çîyayên ku serê wan bi mij û  
dûman. Dinyayeke sar. Dinyayeke di destê seqema  
dijwar de ne di tu halî de...  
Kalo serê xwe rakir û li ezmên niherî. Bi xemgînî.  
Bi çavên melûl. Bi çavên mişt hêsir. Niherînên kûr.  
Mîna bîrên bêbinî...  
Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...  
Kesereke kûr kişand. Serê xwe bi kerb hejand û bera  
ber xwe da. Dû re mijangên xwe bilind kirin û di bin  
wan re dîsa li rêyê niherî.  
Mîna ku mirov li dewsa birîneke kevin binere.  
Mîna ku mirov...  
Di pey hezkirîyekê re binihêre...  
Da ser rêyê. Meşîya.  
Lêwik jî da dû...  
Du şev û du rojan meşîyan. Di nav çend gundên din  
re jî bihurîn.  
Li her gundekî çend xortên din bi dû wan diketin. Li  
her gundekî, çîrokeke din li çîrokan wan zêde dibû.  
Li her gundekî pirtir dibûn...  
Du şev û du rojên din jî meşîyan. Di nav gelek gundî  
re bihurîn. Gelek xortên din xwe da tengala wan.  
Gelek dilên din jî tev li wan bûn. Ê carekê jî



nesekinîn û bêhna xwe venekir. Li dû xwe neniherî.  
Her meşîyan?  
Zilamê Kal li pêşîyê. Xort li dû wî.  
Ba li wan rabû. Baran barîya, şil û pil bûn.  
Berfê dayê. Heta çongê di nav re çûn.  
Nesekinîn. Her meşîyan?  
Rê dûr e. Rê dirêj e. Hê gelek heye...  
Zilamekî kal. Por spî. Rîh dirêj. Bêdengîyeke kûr.  
Meraqa her gundê ku ew tê re dibihurîn, bêtir dibû.  
Li pey wî bireke xort...  
Du şev û du rojên din jî meşîyan. Westîyan.  
Hemûyan berê xwe da daristanekê. Li daristanê, li  
sitarekê gerîyan. Girîyan.  
Tava heyvê dawerivîbû ser rûyê çemê zirav. Li wan  
temaşê dikir.  
Xişê xişê pelan bû...  
Zilamê kal li wan zîvirî.  
"We xêr e?..."  
Xortekî nûgihîştî. Di çax û benga xwe de. Emrê wî  
çardeh. Lê belê, situxwar. Melûl, xemgîn û  
westîyayî.  
Got, "Tu kî yî?.."  
Zilamê kal bersiv neda. Berê xwe guhert û meşîya.  
2.  
Zilamê kal dimeşîya. Xort li dû. Di gundan re  
dibihurîn. Li kilam û stranên dengbêjan guhdarî  
dikirin. Pîrekan ji wan re dilîrand.  
Li qiraxa her çemî disekinîn. Çem disekinî. Straneke

xweş çawa bisekine, ew jî weha... Rê ji wan re vedikir. Di ser çêm re derbas dibûn. Çem dîsa diherikî. Straneke xweş çawa dest pê bike û biherike. Ew jî weha...

Li ser rêyê gelek kes tev li wan dibûn. Kesên rêwî. Hin ji wan wendayî. Hin ji wan derketî. Hin ji wan qewirandî. Û hin ji wan revok...

Rojekê dîsa li ber çemekê sekinîn.

Zilamê kal li wan zîvirî.

Niherî.

"We xêr e?..."

Xortekî nûgihîştî. Çardehsalî. Por gijolî. Rû xweşik.

Çav melûl. Westîyayî. Got, "Tu kê yî?... "

Zilamê kal serê xwe bi kerb kil kir. Vegerîya. Da ser rêya xwe. Meşîya.

3.

Dem di ber çemekê re diçû. Dem nezan. Hemû demsalên umir li devereke nenas diman.

Zilamê kal dimeşîya. Xort li dû.

Êdî êvaran disekinîn. Xwe dida bende sibehan. Xwe dida bende bersivan. Yek ji wan jî nedipeyivî.

Kalo tevî bira xortan xwe li daristanan digirt. Nêzîkî çeman rûdiniştin. Yekî ji wan agirekî gûr dadida.

Tînê dida dilên wan. Tînê dida dora wan. Teyr û tilûran xwe li agirê wan digirt. Pelçîmok, başoke, quling, kund û kevokan jî...

Çi bêdengîya êvarê. Çemê dorê. Dengê dûrik û kilamên ku di guhên wan de...

Zilamê kal li wan niherî. Wan jî li wî niherî. Ji ber sermayê di halekî xerab de bûn.  
Westîyayî. Bê xew...  
Dilê wî bi wan şewitî.  
"Vegerin malên xwe, lawo!"  
Û deng ji yekî jî derneket.  
Şewqa êgir xwe da rûyê wan. Çavên wan biriqîn.  
Weke ku ne li ser hişê xwe bûn.  
Giş dişibîyan hevdu. Yek jî nedişibîya yekî din.  
Weke hev rûniştibûn. Weke hev diniherî. Li pey eynî tiştî bûn. Ji bo eynî tiştî ketibûn rê. Gişan qesda eynî deverê kiribû. Hemûyan eynî tişt miraq dikir.  
"Tu kî yî?..."  
Zilamê kal fikirî. Li rûyê wan yek bi yek niherî.  
Bîstikekê li dengê çem guhdarî kir. Li rengê êvarê temaşe kir. Li dengê teyr û tilûran... Li xwezayê... Li bêdengîya wê... Li tarîtiya wê?  
Dû re, dîsa li wan zîvirî. Rûyê wî tabloya kerbê.  
Dengê wî lertzokî.  
"Hûn çi navî li min bikin, ez ew im..."  
Xortekî nûgihîştî. Niherînên wî mişt pirs. Di dilê wî de heyecana hînbûna tişteki nû.  
"Çawa?..."  
Zilamê kal zîvirî û dîsa meşîya.  
Xortan da dû.  
4.  
Şev û roj li pey hev. Meşîyan.  
Roj bûn meh. Meh bûn demsal. Demsal giş li dû

man.

Meşîyan.

Nepeyivîn...

Di gundan re derbas bûn. Ne çol hiştin ne jî beyar.

Xwe ji serê çîyayên biheybet bera xwarê da. Di deştên fireh de bêhna xwe veda. Deştên ne serî xuya ne jî binî?

Ketin nava şerê eşîran. Yekî ji wan jî guh neda şer.

Bêrîvanan şîr û nivîşk ji wan re kirin taştê.

Kevanîyan nanên şikeva pêşkêşî wan kirin.

Lê yekî ji wan jî lê neniherî.

Zewade bi devê wan nebû.

Çem bi çem. Daristan bi daristan. Welat bi welat...

Meşîyan...

Zilamekî kal û bireke xort.

Newal derket pêşîya wan. Nesekinîn.

Xwe lê xist.

Tofan rabû. Guh nedayê.

Meşîyan...

Şev û roj li pey hev. Meşîyan. Westîyan. Lê vê carê negirîyan.

Her yek ji gundekî bû. Giş bi zimanekî dipeyivîn.

Her yek bi zimanekî.

Peyiv ji bîr kiribûn...

Li qiraxa çemekî din sekinîn dîsa. Tarî ket erdê.

Dinya sar. Seqemeke dijwar. Xortan agirek dada.

Agirekî gûr. Li dorê civîyan. Hemûyan bi hevdu re bala xwe da zilamê kal.

Zilamê kal. Zilamekî biyanî. Rêwîyek. Rêwîyekî li  
vê çolê. Rêwîyekî ecêb. Li çêm guhdarî dikir.

Hêdîka di ser milên xwe re zîvirî.

Li wan niherî.

Xortan jî serên xwe rakirin û li wî niherî.

Çavên wan ên sor bi şewqa êgir dibiriqîn. Çavên  
wan xemgîn. Mîna ku li ber wî bigerin lê diniherî...

Zilamê kal. Ecêbmayî. Heyirî. Dilekî bi miraqa  
mişt. Deng kubar. Lertzokî. Westîyayî...

"Hûn kî nin?..."

Kesî bersiv neda. Serên xwe bera ber xwe dan.

Hemûyan fedî kir. Hemû ponijîn.

Zilamê kal dîsa got:

"Hûn kî nin?..."

Xort rabûn û meşîyan. Serî di ber de. Belav bûn. Her  
yek bi rêyekê de çûn. Di tarîyê de wenda bûn.

Giş dişibîyan hevdu?

Zilamê kal di pey wan re niherî. Weke ku li  
xortaniya xwe binihêre.

Dilê wî bi wan dişewitî...

Her yek bi zimanekî dipeyvîn.

Giş bi zimanekî...

Her yekî berê xwe bi deverekê ve kir. Her yekî da  
ser rêyekê. Belav bûn...

Hûn çi navî li wan bikin, ew ew in...

Hevsarê dilê min

Beşîr Bagokî: Bagoko88@hotmail.com

Tiştê hatî serê min Xwedê neyêne serê gurên

Norvêc. Ev tam pênc salên min qediyar ku min hevsarê dilê xwe teslîmî wê kirî. Tam berya pênc salan, wê soz da bû min ku hevsarê vî dilê reben, şepirze û bêxweyî gundo gundo, malo malo bigerîne bê ma heme bi arîkariya Rebê Alemê li deverkê nahewîne. Lê îro xeberek nexêrê ji min re hatiye dibê Hesînka -ma êdî ezê navê wê xweş bikim û bê Meta Hesîncan- hevsarê dilê te bi dartûya hewşa xwe ve girê daye û ev serê pênc salaye li wir girêdayî ji bîr kiriye.

Rebîî, êne weke yê ku hem ji dêrê bûyî hem ji camiyê, ez ne zanim ne dî'a bikim ne jî nifiran. Heke min zanîbane ezî weke xaltîka xwe Sêvê, bê çawa bi nifirekê kir ku çêleka mala Emerê Silêmên weke pepeqonkê "şîşhmîş"bû û bi du nifiran totlanî ser hev bû, ezî wê dartûyê ji qurm hilkim. Lê ez rebenê Xwedê li kû xaltîka min Sêvê li kû!

Erê bi wê Heca ku hûn xwendevan çûnê kim, ev pênc sale, yanî zêdeyî sêhezâr û sêsed rojiye ku dilê min li hewşekê, bi darekê ve girêdayî maye, li ber ba û baranê, li ber sir û sermayê. Ma Hesînka li te qirikê nayê bîra te bê min bi çî xewn û xeyalan ew hevsar spartibû te. Ma tu ji Xwedê netirsiyayî vî dilê rojekê li deştan yekê li zozanan bi darekê ve girêdê? Êne min bi wî dilê xwe karîbû dara hûr bikim. Ne go ez wesfê xwe didim, min karîbû ew çiyayê ku Ferhat bi salan li ber kolandina wî da, di du-sê deqande ser û binî hev bikira.

Lê bere kes şaş fam neke. Heyfa min nayê wê heyfê ku dilê min bi salan bi werîsan girêdayî maye. Heyfa min tê wê heyfê ku yek evdê Xwedê, heme rêzikek jî li ser vî dilê minî dîl nenivîsand. Ewqas hozan û hunermendên me hene yekî ji van çar gotin neavêtin ser dilê min. Yekî ji wan heyfa min ji Hesînka nehiland û dilê min lê hînîk nekir.

Ma ez hewara xwe bi kê bighînim? Gazin û giliyên xwe li kê bikim? Bav û kalan ne belesebeb gotine "ku ne mirov pişta xwe bi destê xwe bixwerênê kes pişta mirov naxwerênê". Îca bi destûra we ez pişta xwe bi destê xwe bixwerînim û çend rêzikan li ser xwe binivîsim.

Lê lê yadê min go tu nizanê îro dilê min ketye çi halan

û minê digo ew Hesînka ku min jê re digot "Meta Hesîncan"

ew ku min bawerî pê aniye da dilê min bigerênê li çol û çiyar

De wê qirik û rebenê dilê min girêdaye bi dara tuyan

Ay li minê, li minê, li minê, li minê lê lê yadê

Lê lê yadê min go heyfa min nayê wê heyfê ku dilê min maye girêdayî

Lê lê belê heyfa min tê wê heyfê ku bi dihan

nivîskar, hozan û helbestvanên me kurdan heyî

De bawerke yekî ji wan destê xwe ne avête defter û pênuş û saz û zirneyî

De heme ji bo xatirê navê Xwedê du sê gotink li ser

min negotin û nenivîsadine wî  
Ay li minê, li minê, li minê, li minê, li minê lê lê  
yadê.

Têbînî: Min muzîka vê tekstê jî daniye. Ew  
hunermendê ku bixwaze vê strana min bixwîne bere  
acele pêwendiyê bi Daîreya Muzîka Kezebşewitiyan  
re deyne.

2002-09

Nameyeke vekirî ji

xwedîqerewatên qodeman re

Beşîr Bagokî: Bagoko88@hotmail.com

Xwedîqerewatên hêja,

Di vê dema ku hûn ji bo dengên me, xwe diavêjin  
malên me de, di vê dema ku qedr û qîmetê me bilind  
e, di van her sê-çar hefteyên ku em bi xwe dihesin  
ku hûn jî mirovên mîna me dixwin, divexwin û heşa  
dirîn de, ezê şert û mercên dana dengên xwe û  
malbata xwe ji we re eşkere bikim. Ev bû çend sal  
hûn xeber didin em guhdar dikin, de carek jî em  
xebere bidin, hûn guhdar bikin!

Jiyana vê heyamê nehesaniye ezbenî. Em gelek  
caran li nanê psî jî dimînine heyirî. Ji roja ku em ji  
gundkê xwe derketine penîr û goşt bi devê zarokan  
neketiye. Jajî û lorik li me bûye hesret, di xewnan de  
jî em hew mewîj û basîqê dibînin. Heya pehniya me  
bi erdê ve neyê em pêlavekê jî peyde nakin.

Elhemdile, sed siphan ji navê Xwedê re, mala  
Xwedê ava dîse jî îdare dibe.



Xwedîqerewatên qodeman! Camêrên wek we dinyadîtî û alim baş dizanin ku mirov çi bike ji bo zarokên xwe dike. Hemû kêferata min jî kirî ji bo xatrê rizqê van zarokan bûye. Di nav ewqas nexweşî, xizanî û perîşaniyê de jî, ji bo ku ez dilê wan nehêlim tişteke namîne ez nakim. Lê ez dawa tu arîkariya aborî li we nakim. Weke min got heya vêga Xwedê diqedîne. Şertê ku ez dengên me pê ve girêdidim, pirsgirêkek ku em bi xwe nikarin çareser bikin e.

Camêrên xwedîqerewat, pirsgirêka ku zêdeyî qeweta me ye daxwaza kurê min Derwêş e. Derwêşk – xulamtiya we bike- êdî çaxê sîpeloktiyê jî derbas kir. Nehîtekî fêrisan jê derketiye maşelleh. Bihara bê wê şazdihê dagire, xeta simbêlan li ser lêvê reş dike. Îcar çaxê zewaca wî hatiye.

Xortên vê heyamê hebekî ji xwe razîne ezbenî û Derwêşk jî yek ji wan e, em dibêjin kî ew dibêje na. Mêriko kesî naecibîne. Heta bi keça Erfato jî qayil nebû. Dibêje ku dilê wî ketiye keçeke binavê Demoqrasiyê û ger ne ew be kesî nayîne. Min ji der û doran pirsyar kir ev Demoqrasî kî ye, çawa ye, keça kê ye dilê Derwêşkê min ji xwe re biriye.

Dawiya lêgerînê ji min re hat gotin ku ew keça şerqî ya bî ye û vêga li rojava dimîne.

Fêrisno, ya rastî hûn bixwazin di jiyana min de çavê min bi vê Demoqrasîkê neketiye û wêneyekî wê jî tine ez nîşanî we bidim. Ew kor be, şeht be, çi bejn û

bal li ser be ez nizanim. Lê nav û dengê wê belav  
bûye û Derwêşko biryara xwe daye ku ger ne  
Demoqrasîk be ew kesî naxwaze. Îcar heke ev keç  
reş weke tenî jî be û qam û qiyafetê wê bi erdê ve be  
jî, ez dilê Derwêşê xwe nahêlim û piştî wî tiliya xwe  
bi wê ve kiriye ez jî dibêjim heme sed carî  
Demoqrasî.

Min heya vêga ji bo anîna Demoqrasîkê pir rê  
ceribandine û gelek tab jî dîtiye. Lê belê min kir û  
nekir ji min nehat ez wê biguhêzin. Lewma çara min  
ma hûn payebilindên ku vêga di nav me de dengên  
me dixwazin. Min ehd daye li ber destê dayika  
Derwêş, ku ez û malbata xwe dengê xwe bidin wî  
xwedîqerewatê ku di xwestina Demoqrasiyê de  
arîkariya me bike.

Bi silavên nerm!

Beşîr Bagokî

2002-10

PÎRÊN BI NEPEN

Fevzi Bilge:

Di sibehek buharê de gava rabûm ser xwe, min li ser  
şaneşînê ji derve nêrî. Şilbûna erdê û pelên daran,  
diyarbû ku ji êvar de baran bariyaye. Pelên daran nû  
buşkuvîbûn, bayekî nerm şaxên daran dihejand, li  
bin guhên hevdû dixistin û dîsa disekinîn. Dema  
ketim rê ji bona herim rawestgehê, roj bilind bûbû,  
tîrêjên rojê tînek pir xweş didan mirov, coş û  
heyecanek biyan xwîn di ciyê xwe da dikeland.

Ji bona wêneyê Zembîlfroş saz bikim ez û hevalê  
xwe yê wênesaz Rizo, me li rawestgehê hevdû dît.  
Jixwe roja berê ve ji çûyinê ra me biryar dabû. Em li  
erebê siwar hatin, piştî demeke kÿn li Farqînê li  
himber kelê em peya bûn. Bi dîtina kelê em herdû jî  
bi lez ber bi wê de meşyan. Hevalê min amûrên xwe  
derxist. Li qorziyekê sekinî û weke dereng mabe  
dest bi xêzkirina keleyê kir. Ez jî li dora wê diçûm û  
dihatim. Ev cara çendabû nizanim, li dora wê  
dizîvirîm. Amûrên min di destê min, çenteyê min di  
milê min de, ji aliyekî jî min wêneyên wê dikişand;  
bi taybetî jî rolyefên şêrên li ser dîwaran...  
Westandina min pir ne li ser bala min bû. Hilkişiyam  
ser keleyê. Li jorê keleyê dîmenên bajêr pir xweş  
xwiya dikir. Bi taybetî jî dîmenê mizgefta  
Selehadînê Eyûbî. Dema li jorê bircan digeriyam,  
newayên dûrika Zembîlfroş dihat guhê min û çavên  
min li her qorzîkê li Xatûn ê digeriya. Di nava  
hestên werê xweş da deriyê odayekê bala min  
kişand. Hêzek nepen ez bi ber wê de kişandim. Bi  
ketina min î odayê li ber çavên min reş hat. Tişt ji  
min ne xwiya bû. Bêhnek efsûnî, newayeke dilşewat  
ez bi aliyê hundur ve hîn bêhtir kişandim. Hîn çavê  
min fêrî odayê nebûbû, rew rew girt û pişt re hêdî  
hêdî zelal bû. Bi zelalbûnê re pîrek weke ecêbekê  
xwe nişkav de avêt ser min û bi min veda. Bi vedana  
wê re amûrên min ji destê min pekiyan erdê. Di cihê  
xwe de mat mam sekinîm, dest û lingên min sistbûn.

Serê min weke yê sermestekî gêj bû, dinya li dora min zivirî, diricifîm. Tevnê xwe bi awayekî şerpeze li min digerland. Xuya bû ku pîrê ez xistibûm kemîneke pir xedar. Ev pîra ne weke yên ku heya nuha min dîtibûn. Rengê wê bi ser sor ve diçû. Xêzên zer di nava zikê wê û dora lepilên wê de weke lîbasên jinên Qerejdaxîyan bû. Neqşên sêqorzî her yek ji renekî din di paşîya piştta wê xuya dikirin. Qiloçên wê hebûn û weke kofiyek tevde bi zêr xemilî disekinîn. Li dora hustê wê niqtikên rengê zîv weke çend qor morî li ser hevdû xistibê dihate xuyanî, bi wê xemlê gişî jî dîsa pir bi heybet xuya dikir. Mirov nikarîbû li çavên wê binêriya tirsek biyan dida mirov. Serê neynuk ên wê sor bûn, tu yê bêjî qey hine dabuyê. Gava bala min kete çavên wê, bi rastî jî ez veciniqîm, çavên wê weke yên Nefertîtî pir kil pê dabe rengê wê yên reş hîn reş xuyadikir û bêhneke xerîb ji wê difuriya. Dema bi ser hişê xwe de hatim, min nikarîbû xwe tevbilivanda. Rahîşt min û ez ber bi qulika xwe ve kişandim. Dema ez xistim hundur danîm erdê. Min hinekî li ber xwe da. Xwêdanek cemidî ji aniya min diherikî. Perpitandina min weke teyrek î baskokirî ez bê çare hiştibûm. Her ku xwêdan ji min diherikî tevnê pîrê hîn zêde bi laşê min dizeliqî, weke mezeloqê hîn tîr dibû. Min êdî li ber xwe jî nedida. Ji kerb û hêrsa hêstir ji çavên min pejiqîn, li ser gepên min kom bûn, dûre gundirîn ser simbêlên min, ji wir jî niqutîn erdê. Hêstirên min

weke rûbarek î piçûk herikî hundurê qulika pîrê.  
Hêdî hêdî pîrek din ji qulikê derket. Rengê wê ji ya  
din cudatir û hîn balkêştir bû. Rengê wê bi ser  
pembe ve diçû, niqtikên rengê zer li ser wê bela bûn  
weke fistanekî pirîsko li xwe kiribe. Qiloçên wê hîn  
dirêj û serê wan ji rengê şurikî, hinek jî sor weke du  
şarên hemayî lê gerandibe disekinî. Di binê zikê wê  
de jî neqşên sêqorzî ; her yek ji rengê din, bi giranî  
mohr û zer xuya dikir.

Çavên wê kesk bûn, wê jî dora çavê xwe weke yên  
Kleopatrayê kil dabû û keskbûn û girbûna çavê wê  
hîn balkêştir dikir. Mirov ji wê xof digirt. Piştî  
hatina wê pîra din ji ber çavan wendabû.

Pîrê rapelikî min. Lêva min î direcifî ya jêr maç kir.  
Ji xurîkê, çavên min diperpitîn. Ji hêstirên ser gepên  
min civiyabûn hinek vedixwar an jî paqij dikir  
nizanim.

Dîsa devê xwe nêzî lêva min î jêr kir û maçkir. Piştî  
maçkirinê destên xwe avêt binê zikê xwe, qalikê  
xwe ji xwe şeqitand. Bi şeqitandinê ra jineke bi  
xweşikbûnê bê emsal ji nava qalik derket. Li himber  
pakhûn û bedewbûna wê çavên min çûn nava serê  
min. Tu nabêjî ew Xatûnê û pîra din jî navmaliya wê  
an jî nobedara wê buye. Piştî qalikê xwe danî,  
roniyeke weke heyvek çarderojkî hilê şewqa wê  
tevisî ser çavên min, ji şewqê çavên min berê hatin  
girtin, piştî dîsa rew rew girt û hêdî hêdî fêrî  
rohniyê bûn. Min derdê xwe ji bîr kir, ketim seyrana

pakbûn û bedewbûna wê. Xwe li ser textekî gelek kevnare dirêj kir û ziq li nava çavê min dinêrî, çend caran çav da min û mizmizî. Ev helwesta wê dilê min hejand û bû tep û repa wî, çongê min sist bûn, dîsa xwêdaneke cemidî ji aniya min herikî jêr. Destê xwe bi ber min de dirêj kir. Di nava nivînên tevde hevrîşim de weke qaşek li ser mermerê reş an histêrka sibehê ku di berbangê de hiltê, diçûrisand. Fîstanê xwe yên tenik, ji rengê narincî, bi tayên zêr ve hatibûn neqşandin, heya nêvî ji xwe şeqitand. Canê wê yî weke berfa Qerejdaxê derket holê. Lêva min hişk, devê min zuha, xweziya min bi zor diçû xwarê. Bi rastî jî singên wê weke zozanê heft eşîran bilind û tije bûn. Pozên çilakî weke giyayê elî, lêvên wê yên sor weke hilalkan xweşik bûn û bedewbûna wê hîn bê tehamûl dikir. Ku ez bawerim Zembîlfroşê sund xwarî jî bê teredut karibû sunda xwe xerabikira û gunehkar biba li himber wê pakbûn û bedewbûnê. Dema awirên me ketin hevdû dîsa kenîya û diranên mircanî kezaba min peritand. Weke mîrkûtek li ser dilê min ketibe devê min kete hevdû, lal bûm. Piştî destê xwe yên narîn bi tiliyên xwe yên dirêj guliyên xwe vekir û porên weke di ava zêr dabû be di paşîya piştî xwe va berda. Bi lênerînek dawetkar dîsa li min nêrî, destê xwe di ber min de dirêj kir. Min xwest bi ber wê de herim, bi xwe hesiyam ku girêdayî me. Bi dengê tenik ba nobedara xwe kir. Pîrê bi lez hat, ez nava tevnê xwe

da derxistim. Bi destê min girt, bi ber xatûnê ve birim û ji ber çavan wendabû. Ez weke pepûkan, weke çêçikeke nû ji hêka xwe derketibe û dinya ne dîtibe sar û bê helwest sekinî bûm. Him şaş, him fahş bûbûm a rastî.

Xatûnê tu yê bêjî qey bi sed salan e li hêviya min bû. Bi destê min girt, ez di ber xwe de kişandim. Min xwe li ser ciyan dirêj kir, lê bê helwestbûna min didomiya. Wê weke tîrmarekê xwe li min gerand, her derê min dipeland, maç dikir, têr nedibû û dîsa maç dikir. Heya nuha min qet tişteki werê nedîbû, ne jiyabûm...

Ji nişkav de dengê qibe, weke du ewrên reş li hevdu bikeve û birûsk vede dengê mîr em herdû jî ji ciyê xwe çend kirin. Gurîniya deng li gişî bircê bela bû. Xatûnê şerpezebû, bi lez kete nava qalikê xwe û tevn li dora xwe hûna, ji ber çavan wendabû.

Piştî Xatûnê çû, demeke dirêj weke darek kok berdabe, şipya werê sekinîm. Heta bi ser hişê xwe de hatim, bi destpelingê min xwe bera jêrî keleyê da. Hevalê min ê wênesaz wêneyên xwe qedandibû, li ser qorzîka piyên keleyê li hêviya min disekinî. Ez jî çûm li kêleka wî rûniştim, kilam ji min çênedibû, destê min dihejiyan, min ji nû de dest bi xêzkirina neqşên keleyê kir. Lê ricifa destê min ne dihişt wêne xweşik bê. Xêzê min xwaro maro dibûn. Ev rewşa min bala hevalê min kişand, çend pirs kirin û pirsên wî bê bersiv man. Heya ku neqşên min qediya min

amûrên xwe da hevdû, hevalê min jî tê giha ku em ê herin, wî jî xwe da hevdû. Em ketin rê, bi rê de çend caran dihulkumîm. Buyerê ez sewsî kiribûm. Hevalê min li rûyê min ê bê wate dinêrî, tişt fahm nedikir. Bi wî awayî em gihan malê.

Sibehê zû daketim kargeha xwe. Min amûrên xwe amade kir û min ê êdî wêneyên xwe yê esas saz bikira bi boyaxa zeytî. Ev roja û çend rojê din jî sibê heya roj diçû ava bê rawestandî li ser wêneyê Zembîlfroş û Xatûnê xebitîm.

Wêneyên min hêdî hêdî bi ber hevdû de dihat. Piştî min diêşiya, carna nigê min ditevizî lê dîsa jî nedisekinîm. Min wêne carna datanî dûr, carna jî datanî nêzî xwe û lê temaşe dikir.

Min çavên Xatûnê yên xweşik rutuşên dawî diavêtinê, çavên wê weke pînbokên şîn dibiriqîn û tije hêst bûn. Carekê min dît hema pîrek hat û bi lez êrîşî çavên xatûnê kir; bi lepên xwe zû bî zû xera kir, piştî rabû ser herdû lingên xwe yên dawî û lepên xwe yên pêşî bilind kir, qiloçên xwe ji min re hejand û deng nekir dîsa wendabû.

Ew helwesta pîrê çend roja ez fikirandim, ketim ramanên kûr, heya tê gihiştim ku min çavê Xatûnê bi şaşî şîn çêkiriye. Dîsa min ji serî de çavên Xatûnê saz kirin û îcar rengê kesk, keskekî şêxanî dayê.

Min dîsa wêne danî dûrî xwe û bi çavên rexnegirekî lê temaşe kir, ka bê kêmasî heye yan na. Xatûnê dikeniya, di wêneyê ku min saz kiribû ne dikeniya,



heya mirov karî bibêjê bê mad bû. Min li rûyê wê nêrî, dîsa çav da min. Bi destê min girt û ji nişkav de ez xistim nava tabloyê. Jixwe êdî ez jî li benda helwestek were bûm. Êdî ji wê bêhtir min ew maç dikir. Min nava zirav pêça û ber bi xwe de kişand. Ez êdî evîndarekî malşewitî û dilperitî bûm. Xatûnê jî, ji kêf û evînê devê wê nedihat serhevdû. Nalînek xweş ji wê dihat. Bi nalîna min re dibû rêheval û dengê me li kargehê belav dibû. Bi zûrîniyek dilşewat dîsa em herdû çengbûn ser xwe. Ev dengê nas yê mîr bû. Bi şida kete hundur. Xencerek kalanî du devo di destê wî de û bi ber min de dihat. Deng ji min jî û ji Xatûnê jî biliyabû. Tê giham ku jiyana min di roja min î herî xweş de wê biqede. Çavê mîr li serê wî dizîzikîn, kef bi ser devê wî ketibû. Xwînek reş û tîr ji herdû guhên wî dipijiqîn. Gimegimeke weke pîra huta ji wî dihat û her ku diçû nêzî min dibû. Xatûnê qalikekî pîran da min ku ji bona ez jî li xwe kim. Dilê wê rehet nebû wê li min kir, ez jî ketim nava qalik. Ez jî êdî bûbûm pîrê. Lê mîr êdî hêza xwe giş dida hev ku ji bona xencerê li ser dilê min bixe. Pîra navmalî ji nişkav de pengizî ser çavê mîr û dev herdû çavên wî kir, qêrînek bi wî ket. Ji êşan li ciyê xwe diperpitî, sewesî û şuşî erdê bû. Weke meYTEKÎ ku heft sal e rûh jê çûbe li erdê dirêj bû. Deng û nalîn jê biliya. Piştî ketina mîr, Xatûnê xwe avêt himbêza min, me herdûka li hevdû nêrî. Rûyê Xatûnê dîsa sorahî

ketê,lêvên min î zuha hîn jî diricifîn, perpilandina çavê min sekinî. Bi lînerîneke matmayî tenê min li Xatûnê dinêrî. Bi tiqîniya deriyê kargehê Rizo kete hundur, bi çend dangan ba min kir. Deng dihat min, lê dengê min ne diçû wî.

Çav li wêne ket berê şaş bû, serê xwe hejand dûre kenîya û got : “ Li mamoste binêre xwe kiriye zembîlfiroş. Xatûne jî çukas xweşik e law!” Dilê xwe bijand wêne û got : “Gelo ezê jî rojekê bikaribim wêneyê Xatûnê ewkasa xweşik saz bikim.” Bi gotina wî re madê Xatûnê xerabû, tirşbû. Pîra navmalî bi ber Rizo da pengizî û ez jî ji ciyê xwe pengizîm. Ji nava tabloyê derketim û heya ku Xwedê hêz da, min hişk bi wê girt û ji wê re got : “ Heger tu dev li wî bikî ezê jî dev li te bikim!” Kenîya û bi şûn de veşariya. Pîrê dîsa çû xwe veşart. Ew kenê wê ji min re bê wate hat, Xatûnê jî kenîya. Rizo qidûmşikestî, bi rûyê xwe yê pak û bedew ji bona ku buyerê fahm bike bê deng li me temaşe dikir. Demeke werê ma, dûre bejna xwe ya tenik û dirêj tewand, rahişt tabloyê, bir bi odeya mezinve darvekir. Çû li himber tabloyê sekinî, kete temaşeyek dirêj. Bi heyranî lê dinêrî. Êdî peytand ku mamosteyê wî buye wêne û nema ji wê dinya xweş vedigere. Çavên wî yê renghunguvîn tije hêsir bûn. Min jî debar nekîr, ji çavên min jî hêstir bariyan. Lewra min jî pir ji wî hezdikir. Li himber tabloyê sekinî, xatir ji min xwest û ber bi deriyê kargehê ve

meşîya. Destê xwe avêt qulpa derî. Hew min dît ku pîra navmalî xwe avêt ser wî û dev lê kirê, tevnê xwe li wî gerand û ber bi qulika xwe de bir, xiste qulikê.

DÎNEKÎ DÎN

FEVZÎ BÎLGE: fewzibilge@malper.net

Xwişka min bi tirs beziya hundur. Ji ruyê wê rengê zer difûriya. sorahiyê ji zû de bar kiribû. Ziman lalûte digeriya, qidûm xwe dabû dest. Diya min, mîna kuliya, di ber wê de pengizî. Sewalên wê bû cercûra keleşê, li ser hev didomiya.

Xwêdan li xwişka min cemidî, zivirî, tayek sar ji bedenê keldûman weke mija sibê bilind dibû. Weke çûkek, di nava ava berfê de diricifî. Tasa çingo, mişt av vexwar. Sor zivirî, qidûm li ber xwe dida. Hêdî hêdî xwe bera ser yanê da. Ziman geriya go: Ez di tariyê de çûbûm hewşê ji bona bêdrokek av bînim ji kaniyê. Pîrebokekê xwe rê min da. Li himber min sekinî bû. Gopalek di destê wê de bû.

Pirs bû cenga lêvan, xwişka min dor girt got;  
Pîrabokek bi fîstaneke spî, weke yê periyar, porê wê dirêj, du gulî, weke du marê reş û zer xwe li hevdû gerandibûn. Çav bi kil, taca wê mîna a şahmaran di serî de diçûrisand. Hîn zar û ziman ne westiya bû. Tiqa tiqa kenê min ez dam dest. Du awir zivirîn li ser ruyê min xeber vedan. Ji sûnd xwarinê têr nebûn, bû şeq şeqa sîlan. Sîle direqisîn, li ser ruyê biçûk, ken zivirî bû şebnem, hêstir bariyan, weke tavek

biharê. Tirsê cih guherî, kete dilekî neh salî, bû  
evîn, dil ket wêneyan, wêne di domiya di her jiyane  
de dîsa di kemilî.

Sedem çêkirina wêneyekî periyekê, li ser dîwarê  
qesrê bû. Di tariyê de xwişka min pir tirsîya bû.  
Xeyda min dirêj domand, Sal dadîqurtand.

Li hundir li ber paceyê mîna pepûkan rûniştî bûm.  
Fikr û ramanan qorziyên mejiyên min, hêdî hêdî  
dikerisand. Yek carna jî talan dikir.

Di xewneke dirêj û bi kabûsda carna wînda, carna  
şiyar dibûm. Kabîsê mîna marekî ziya ez  
daduqurtandim, hewar û gaziya min ne diçû kesekî,  
belkî jî diçû. Min dixwest ji nava devê mar derê,   
bimeşim, birevim û bi dûr kevim. Mar ez  
dihezimandim, hêdî hêdî diheliyam, biçûk dibûm.  
Min xwe li xwe digerand û min xwe qebûl nedikir.  
Di nava min de bahoz diteqîyan, dervên min di nava  
girêzek de dimexiya, şil û pil dibû.

Bi dengê diya xwe, çeng bûm ser xwe. Diya min got  
; Lawê min here di nava nivînên xwe de razê.  
Rabûm, çûm nava cilan, xewa min ne dihat, rabûm,  
di ber neynikê de meşîyan, li himber neynikê  
sekinîm, min li xwe nihêrî.

Ji xwêdanek mezeloq, bedena min şil bûbû, porên  
min gijo mijo, mîna çêlîkên nû zayî. Şeytan henekê  
xwe bi min dikir, an xwedayan gir ji mi girtibûn. Bi  
dengê azana dîkên sibehê, bi ser hişê xwe de hatim.  
Bi hêstên xwe dimeşiyam, nigên min tevizî bûn, ez

hilnedigirtim. Bi dizî mîna tajiyeke nig bi hine, li ser neynukan meşiyam û çûm, odeya ku wêne lê çê dikim. Bavê min, dema ku min wêne çê dikir dixeyidî. Digot ; lawê min tu xwe bi tiştê bela sebeb dixapînî. Ev ji tu îşê te re nabe. Dersên xwe yê din bixebite.

Min bi dizî deriyê odeyê vekir. Amûrên xwe ji qul milan derxist, danî ber xwe. Dest bi sazkirina xewn û xeyalên ku bi şev jiyabûm kir. Heta tevizîm bi wêne re lebigim. Min wêne danî dûrî xwe û kûr kûr lê temaşe kir. Di wêneyê de tirs, êş û xof li hevdû dixistin. Di nava rengên reş û sor de pîrabokan, perî û maran dîlan girtibûn. Piştî çend rutişên din, min wêneya xwe veşart, ji bona kes nebîne.

Qesra bavê min, di nava xaniyên der dorê de, yê bi axê hatibûn avakirin, gelek mezin xûya dikir. Dervê wê spî, bi sê hêwan û deh odan pêk hatibû. Ode û hêwan bi amûrên giranbûha bi xaliyên ecem hatibû raxistin.

Di kulîna diya min de qedere sed qat nivînên tev de bi neqş û tentene hatibûn xemilandin. Rûyên wan giş reng bi reng, bi qumaşê qaçaxî mîna keskesorê diberiqand. Du hewşê wê, li ser erdek gelek mezin û cûrbecûr darên fêkî (meywa) şîn dikir.

Dê û bavê me, em zêde bera derve nedidan. Li gorî wan, zarokên kolanê qirêjî bûn. Yek carna me firar bikira jî bi piranî me li hewşê dileyst . em weke berxên di kozan de bûn. Tenê ji bona çuyîna

dibistanê an ji bona serdana merivekî destûra  
derketinê didan.

Wê sibehê, li baxçe di bin siya dara gûzê rûniştibûm.  
Wêneyê min a veşartî hate bîra min. Xof û kêf di  
dilê min de sargermî bû. Hestên min, min ber bi  
odeya ku ez wêneyan lê saz dikim mîna qadeke  
manyetîkê dikişîşandim. Deriyê odê got ; tik û  
vebû. Ketim hundur, min wêne danî ber pacê û kûr  
lê temaşe kir. Her dû marên tabloyên reş tevlivîya, ji  
wêne derket û xwe ji nişkavde avêt destên min û ber  
bi xwe ve kişand. Min li ber xwe dida, lê hêza min  
têrê nedikir. Destê min, dûre piyên min daqurtand,  
gaziya min ne diçû kesî, xwîn di her derê canê min  
de dipijiqî. Sorahiya rengê wêneyê zêdetir dikir.  
Xwîn diherikî, canê min dicemidî. Qudumê min hêdî  
hêdî xwe dida dest, Marê reş têr nedibû. Dûre xwe  
avêt destên din, têr nedibû nigên min jî daqurtand.  
Hêdî hêdî diqediyam. Ruh li ber xwe dida, çavên  
mar pekîyabûn ji dervê reng diguherîn, şîn dibûn,  
zer dibûn, her ku ez dixwarim sorahiya çavê wî  
zêdetir dibû. Dawiyê xwe avêt dil û kezeba min.  
Rengê çavê mar êdî giş sor bûbû. Şîn û zer êdî xuya  
nedikir. Bi ketina minî erdê, wêne jî got gum kete  
xwarê. Min bi xwe qurincan, êşiya. Min êdî nema  
wêrîbu rahişta wêne, wêne di cih de hişt. Gurpe  
gurpa dilê min, mîna aşekî avê deng derdixist.  
Destên min, li ser dilê min li odê pîkolî dikir, dîsa li  
wêne dinêrî. Ez çukasî ji wêne tirsîya bûm jî dîsa

çavên min, destê min ji wêne ne diqetiya.  
Jiyana min, mîna ya derwêşekî serxoş û gûnehkar.  
Hesretên min, bi wêneyan xemilî, yekcaran  
difiriyam, wêneyên xwe di ruyê xwe de bar dikir.  
Carna diketim, dîsa bilind dibûm. Min destên xwe  
dirêjî ewran dikir. Ewrên reş ji ber rojê dida alî.  
Tîrêjên rojê tîneke dîn, coşeke serxweş dida min.  
Çav dixewirîn, dil dilerizî, difiriyam, bilind dibûm,  
di nava babîsokekê de dengê kete guhên min, got ;  
Li jêr nenêre ez dixwazim tîrêjek xwe bidim te.  
Min rahişt tîrêjê û dîsa vegeriyam min xwe li ber  
wêneya xwe dît. Bi tîrêja destê min, wêne hîn ronî,  
hîn xweşik xuya dikir. Ji bona wêne hîn baş bibînim  
min nêzîkahî lê kir. Wêne dîsa xwe avêt min, bi  
tumerî ez kişandim hundurê xwe. Mîna portreyekê  
di wênê de sar bûm.  
Bi tikîniya deriyê odê bavê min kete hundur. Gazî  
min dikir, li min digeriya. Ha Dîno, tu li kuye, îro  
çend roj. Dîsa tu ne xuyaye. Bê mirad tu li kuye.  
Wêne bala wî kişand di ber wêne de meşiya û got  
;Lawo ! hela li Dîno binêre, wêneyê xwe çikas  
xweşik çê kiriye, eynî tuyê bibêjî qey Dînoye. Lo  
Dîno tu li kuderêye ? Dîno.....o

EVÎNA MEDÊ

Fevzî Bîlge

Di rojek havîna pir germ, di qîjîniya nîvrojê de li ser  
rêya gund dimeşiyam. Cira cira çirçirkan û dengê  
çûkan yek carna jî dengê beqan li nava hevdû diket,

weke goraniyek pir bi deng û ewqasa jî hişk di nava  
bêdengiyê de tirs û xof li der dorê belav dikir.

Piştî ketim nava daristanê, her ku diçû tîna rojê hejar  
bû, siyên darên sitûr û bilind der dor tarî dikirin.  
Pelên wan yên weşiyayî di binê wan de riziyabûn.  
Bayekî hênik û hêwî bêhna wan weke şûjinê li ser  
rûyê min dixist.

Bêdengiyêke kûr ez ditirsandim. Tirsê dikir ku  
gavên xwe hîn bi lez bavêjim. Bi şopa dengê lingên  
min, reqên kêleka çem û birkan xwe dabûn ber tava  
rojê, serserkî xwe davêtin nava avê. Bêdengî her ku  
diçû hîn zêdetir dibû. Jixwe bêdengiyê her tim ez di  
tirsandim. Roj li min geriyabû, ez wenda bûbûm. Ji  
nişkav de rengê her tiştî sor bû, dar weke lawiran bi  
ser min de dihatin. Di cihê xwe de mat mam. Çongê  
min sistbûn, rûniştim. Di nava wê kaosa lal de  
qidûmê min şikestî, devê min ketibû hev û ez jî lal  
bûbûm.

Bi zorê min destê xwe ber bi ezmana de vekir. Ji  
Xwedayê dilovan re dia kir û ji wî xwest bibim  
teyrek. Hîn dia min nû xelas bûbû, bi xurandina pişta  
xwe min destê xwe avêt paş xwe dît ku perik bi  
destê min ve hatin û bi şida mezin bûn, bûne bask.  
Min nigê xwe da erdê û heya hêz di min de hebû  
xwe ber bi jor de hilkir, lê li ser piştê ketim xwarê.  
Dîsa rabûm ser xwe, reviyam û min herdû nigên xwe  
da erdê û ber bi jor de xwe hilkir. Hew min dît ku bi  
hewa ketim, difiriyam. Li hewa min çend fitlok da



xwe û çend cara ji kêfa teqle avêt, carna xwe ji nişkav de bera jêr dida, dîsa badokek dida xwe û bi ber jor de difiriyam. Dema difiriyam min dît ku herdû nigê min piçûk bûn, terîkek li paşiya min şîn hat û bi şida ew jî mezin bû. Êdî ez hîn baştir difiriyam. Ji kêfa dema deng ji min hat, berê min dengê xwe nasnekir. Weke cîze cîza teyrikan bû. Dema min destê xwe avêt devê xwe li tişteki tûj û hişk ket. Devê min jî wenda bûbû û di dewsa wî de nikûlek şîn hatibû. Ji kêfa firandinê tew min gund ji bîr kiribû. Êdî ji wê kaosê xelas bûbûm. Bê rawestandî difiriyam û bi ezmana ve radipelikîm. Min xwest weke Qaqlîbaz Jonathan pir bilind bibim û dîsa min xwe serserî bera jêr da. Jêr li jor mîna boxçikek bi pîne xuya dikir. Min berê xwe da gund. Bi hêsanî min gund dît. Li jor gund pir piçûk xuya dikir. Li ser çiyayekî bilind giş bi kevirên spî hatibû ava kirin. Dora pace û deriyên xwe jî bi kilsê spî kiribûn. Ev rewşa dîmenên gund hîn xweşîktir û balkêştir dikir. Ji xwe gund pir kevn û dîrokî bû. Di nava daran de weke hêlînek çivîka li ser darekêbe dihate xuyanî. Di nava xaniyan de çavê min bi yê mala kalikê min ket. Min xwe bera hundurê hewşê da û ber bi derî ve çûm. Bi nikûlên xwe çend cara li derî xist. Bi tiqîniya derî pîrika min derî vekir. Çav li min ket qêrîn bi wê ket û got ; “hewarê ev çiyê ! hela li vî tebayî binêre hatiye û dixwaze têkeve hundur.” Dikira çav ji serê wê bifiriyana. şerpeze bû kes bi

dengê wê nehesiya, tirsiya. Rahişt melkesê kişkir  
min û dîsa derî girt ziqatê kişand ber.

Lewra min pir bêriya pîrika xwe kiribû û helwesta  
wê pir bi min zor hatibû. Ji hewşê firiya û çûm li  
ser dara guzê danîm. Dara guzê li mergê dinêrî û pir  
mezin û bilind bû. Demeke dirêj sekinîm, ponijîm,  
ketim ramanan.

Di nava wan ramanan de min dît ku xalê min ê piçûk  
hat ser mergê, li ser kulav runişt, çixareyek pêça, û  
wêxist. Piştî çixarê serê xwe danî ser balgîvê, li ser  
piştê xwe dirêj kir. Xuya bû ku ji kar dihat û pir  
westiyayî bû.

Bi dengê pîrika xwe çavên min ber bi aliyê war de  
zîvirîn. Hinekî şerpeze xuya dikir. Zû zû tifik veda,  
xweliya wê berê hinek da alî. Ardû anî xistê û beroş  
danî nêzî tifikê. Bi çend denga ba cîrana xwe kir got  
; “lê Medê hela ji bona Xwedê bi wê satilê ji berdêla  
min ve nifşek av bîne.” Bi dengê wê re qîzikek ji  
hundurê warê xwe derket. Qîzikek heya nuha min  
wê nedîtibû, nas nedikir. Porê wê zer bû û hine  
dabûyê. Ji ber wê jî pir sor dikir. Kiribû du gulî  
avêtibû paş piştê xwe. Dirêj, dagirtî û xurt xuya  
dikir. Ji dest û çepilên wê diyar bû. Çavê wê şîn  
dikir, şînekî vekirî. Kil dabû çavê xwe. Ji ber wê jî  
çavên wê hîn balkêştir bûbûn. Ser çavê wê bi zîwan  
bûn. Lê xweşîkbûna wê xera nedikir.

Dema ber bi satilê ve hat çav li xalê min ket. Hinekî  
sekinî, li wî nêrî û disa meşiya. Rahiştê satilê xwe

bera ber aliyê kaniyê da weke qitika dimeşiya. Bi dizî çend cara li dawiya xwe nêrî. Ken li ber rûyê wê nediket. Tuyê bêjî qey bavê wê miribû, ewqasa bê mad bû. Pîrika min ji aliyekî ve agirê xwe dikir, ji aliyê din ve jî bi xalê min re dipeyivî. Digot ;

“Weleh weleh tu neheqî. Medê weke dalyanekê ye, têra xwe jî xweşik e. Hîn tu yeke çawa dixwazî, nizanim. Li ser te jî mirî ye. Dil ketiye tê û çend sale kî wê dixwaze qebûl nake. Medê hêjaye malê dinyê. Xweliya gundan li serê te be. Xwedê heqê wêji te re nehêle. Ev pepûka te di hundur de pîr kir.”

Xalê min qet guh nedida peyva wê û berê xwe da aliyê cihokê xwe quliband ser kêleka din. Pîrka min hîn jî dipeyivî, pesnê Medê dida û digot; “Dev û ruyê wê weke nanekî genimiye, kevara nava wê a wiha ye. Weke mihîneke boz e. Rind e, bilind e.” Bi hatina Medê re sekinî û ber bi wê de pengizî, satil ji mistê girt. Çû hinek bera beroşê da û beroş danî ser tifikê, li himber rûnişt. Medê jî paşiya xwe da xalê min û li ba pîrika min xwe da erdê. Yek carna wê jî qirşik davête binê tifikê, agir xweşik dikir.

Min li serê darê ew temaşe dikirin. Piştî hatina bav û birayê Medê, Medê kete hundur warê xwe. Piştî şivê tarî kete erdê. Pîrik û xalê min jî çûn ser war, ji bona razan ê. Min jî ev şeva li ser darê guzê derbas kir.

Di berbanga sibê re pîrka min ji bona zeytunê ji doh ve çinîbûn li bajêr bifroşe, barê xwe li kerê kir û kete rê. Pişt re bav û birayê Medê jî ji hundur derketin. Ji

bona herin çinîna zeytunê xwe.

Medê ew herdû bi rê kirin. Çû ser cihokê, şimika xwe danî ber xwe, devdelingê xwe kişand jor, fîstanê xwe hilkir, herdû nigê xwe xiste nava avê, runişt û dest bi durikek evînî kir. Carna çavê wê tije hêsir dibû, bi dizîka çavê xwe bi hubriya xwe paqij dikir, dinihûrand.

Xalê min ji ser war daket û ew jî ber bi cihokê ve çû. Ji bona ser çavê xwe bişo. Qet li aliyê Medê ne dinêrî. Medê çavê xwe ji wî nediqetand. Lê wî qet guh nedida wê. Madê xwe ji wê tirş dikir, awir didanê û bi wê re nêdipeyivî.

Li himber wê helwesta xalê min Medê rabû ser xwe, ber bi dawiya rez de çû. Ez jî firiyam li jor ew şopand. Li dawiya rez li himber dareke ziyaretê sekinî, ji hubriya xwe terîşek jê kir û bi darê ve girêda. Li binê darê runişt û bû îske îska wê, dîsa dest bi girî kir. Her ku ew digiriya ez jî bi wê re digiriyam. Lê heya wê ji min tune bû. Ez zarok bûm lê dîsa jî baş tê giha bûm ku evîna Medê yekalî ye. Min di dilê xwe de got ; “Ax xweziya ez a nuha bîskê bi wê re bi peyiviyama. Mixabin ewê tew ji min bitirse.

Medê heya hinekî kela xwe danî giriya li binê darê runişt û pişt re rabû çû kete hundurê war û heya êvarê ji hundur qet derneket.

Heya ez hatim xalê min xwe girêda bû. Şelwarekî reş, gomlekekî ji rengê narincî, di ser de jî dîsa

êlekekî reş li xwe kiribû. Porê xwe şikinî û temberî xwe bera ser eniya xwe dabû. Çû ser mergê rahişt qutî û hestê xwe,berê xwe da qada gund. Li jor ser serê wî difiriyam. Ew diçû ku min jî ew dişopand. Li qada gund hevalekî xwe dît. Ew û hevalê xwe ber bi aşê gund ve meşyan. Hevalê wî yekî xwîn nexweş rûdaliqî bû. Pir nêzî hev dimeşyan, hevalê wî derdê xwe ji wî re digot ; xalê min jî li wî gohdarî dikir.

Kûr û dirêj peyivîn. Dawiyê de qandî min fahm kir. Dilê hevalê wî di Medê de bûye tu nabêje û çend cara ew xwestiye Madê her carê jî qebl nekiriye. Xalê min hinekî ponijî. Di bin simbêla de keniya û ji hevalê xwe re got; “Hêsan e, ez karim vê meselê çareser bikim.” Çavê hevalê wî beloqî bûn û pirsî got ; “çawa, çawa tu yê çareser bikî.” Xalê min got ; “pir hesan e, tu jî dizanî ku dilê wê di aliyê min de ye. Pir ji min hez dike û ez ji wê re çî bibêjim ewê qebl bike.”

Hevalê wî heya bi guhê xwe sor bû û bi meraq pirsî û got ; “yanî ji bona ku min qebl bike tu yê bi wê re bipeyivî?” Xalê min serê xwe hejand û got ; “na lo, tu zanî ku bi wî hawayî qebl nake.” Hevalê wî dîsa bi meraq û heyecaneke mezin pirsî. Xalê min ji wî re got;

- Ezê wê birevînim

- Ê

- Tu jî li ba Girêsor li paş neqebê xwe veşêre. Kengî

mi anî wir ezê vegerim. Û tu jî wê ji xwe re bibe.  
Bi wî hawayî li hevdû kirin û ji bona ku sibê hevdû  
bibînin ji hevdû qetiyar. Xalê min di ber malê de  
meşiya. Çû li ser mergê rûnişt. Roja din Medê hewşa  
xwe dimalt. Gava piştî pîrka min ji ser mergê çû  
nava rez bi dizî çû ba Medê û ji wê re got ; “Medê  
xwe amade bike ezê sibê te birevînim.”

Medê ji kêf û heyecana berê qebl kir. Dure jî got ;  
“Kuro ma çi hewce ye tu min birevîni. Zanibe ku ji  
te pêv ez tu kesê din nakim. A baş ewe ku hûn werin  
min ji bavê min bixwazin.” Hîn peyva Medê xelas  
nebûbû, ji nişkavde heya Xwedê hêz dabûyê kulmek  
li serê wê xist, Medê ket. Bu kaje waja min lê kesî ji  
min fahm ne dikir.

Xalê min ew xiste nava çewalekî mezin, li piştta xwe  
kir û ber bi aliyê Girêsor de bir. Dema gihaşt ciyê  
xwe hevalê wî ber bi wî de beziya. Bi hevdû re  
çewal danîn erdê, devê çewal vekirin. Bi vekirina  
çewal re herdû pengizîn, wek dupişk bi wan vede  
ceng bûn ser xwe. Çavê herdûya dikira biçûya nava  
serê wan. Rûyên wan sor bû. Ji tirs û xofa dihejiyan  
û nikaribûn li rûyê hevdû binêriyana. Piştî bi ser hişê  
xwe de hatin hevalê wî reviya û li paşiya xwe jî  
nenêrî. Çû, ji ber çavan wenda bû. Medê bûbû  
peyker. Peykerekî reş weke qîrê.

Xalê min rabû rahişt peyker li piştta xwe kir, rapelikî  
ser gir. Li ser gir cih jê re çêkir, çikand. Li ber rûnişt  
û dest bi girî kir. Heya roj çû ava li ber wê rûnişt.

Pişt re çû malê. Weke gêj û teyşa dimeşiya. Qudumê wî şikestîbû. Ûjdana wî ne rehet bû. Dikir ne dikir Medê û rewşa wê ji bîra wî ne diçû. Bi wî awayî gihaşt mal. Serê sibehê were dihate xuyanî ku ne nan xwariye û ne jî razaye. Çavê wî sor bûbûn. Pir poşman bûbû. Sibehê zû dîsa berê xwe da Girêsor ba peykerê Medê, gulek sor di destê wî de gul xiste nava destê peyker. Hêstir ji çavê wî dihatin xwarê. Xwe zeft nekir ji bona Medê li wî bibore xwe avêt peyker himbêz kir û heya roj çû ava bi wê re peyivî. Deng ji peyker nehat. Dîsa çû malê. Ji wê rojê pey de tenê karê wî biçûya û gulek sor ji wê ra bibira. Ev rewşa çend meha werê domand.

Ez jî piştî xalê min diçû mal. Li ba peyker disekinîm. Bûbûm nobedarê wê. Min ne dihişt kes bi dora wê keve. Kî bihata dora peyker min xwe xîjî nava çavên wan dikir. Ew jî ditirsiyan û ji wir bi dûr diketin. Xalê min ji kerb û hêrsa hêjar bûbû, nava wî zirav, çavên wî çûbûn xwarê, pozê wî kişiya bû, dirêj bûbû.gepên wî kort bûbûn.

Wê sibê dîsa gava xalê min gulek sor di destê wî de xuyanî bû.min xwe da alî. Çû dîsa li ser çongê xwe runişt. Dure rabû gula xwe xiste nav destê wê. Çavê wî dîsa ji hêstiran tije bû. Bi carekê min dît ku peyker jî digrî. Kajîn bi min diket, bi qajîniya min peyker sincirî, sor bû, zer bû, dîsa reş bû weke di niqirîskê mirinê de be ricifî û rengê wê hêdî hêdî bû nola berê, rih bi wê ket. Xalê min ji kêfa him

digiriya him jî dikeniya. Ken û hestirên wî di nava hev ketibû. Xwe avêt himbêza Medê û ji nişkav de dîsa herdû jî bune peyker, du peykerê herdem hêstir ji çavê wan diniquete. Ez jî hîn ev roj ev roj e nobadarê wan im.

Tu kes newêre ji tirsî min dest bi wan bide û nola ziyaretan herdem evîndarê wî welatî giş ji bona bigihin miradê xwe têne ziyaretê û gulên sor bi xwe re tînîn

JINA AMÎDAYÎ

FEVZÎ BÎLGE:

werger: Simko Hedreş

Weke hûn dibînin ez jinek Amîdayî me. Li rêçika xwedayan, Qerejdaxê bêrîvanek. Zer bû rengê min, qemirî, guherî di serhildanan de; dîsa jî ne westiyayî me. Xemrî bûm di kendîlan de, biştî her mirinekê bûm Leylayek. Carîna li rojê zivirîm û di sûrên agirîng de kûlilk bişkivîm. Ketselî dibûn polenên firiyayî, bi têla direhî re hevşa dibû carînan. Carîna jî li hember pola radiwestî dilê me.

Bûn Xecê em, ji evîne re serxweş, bêbask difiriyan newalên kur, di berfan de du kûlilkên sor. Hêj Mumunan newelidandî, me ji Herayê re got "amîn". Îro biryardar inn hêsirên çavên min, Penthosu guhdar e. Erk; dibe ku we biefsûnîne, tevî dînamîzmê kirin be jî. Esmeriya min di Volqana Qerejdaxê de xilavek, bêhnên efsûnî yê teqiyayî û belavbûyî biherikînin dilê xwe, bihêlin bila bimîne



di hundirê we de efsûn. Bêparbûnê li guherînên nîtel digerin di kurahiya dilê we de.

Guman nekin stuxwarkirina min ji tirsê peraniyên çarserîne, dê hemûyan kedî bikim. Di morîka eniya min ve diheje de nivisiye qedera min. Felsefa min guherîn, bibînîna dê biguherînim jî.

Min ji etaran kiri dolbenta rengîn a serê xwe. Zen dikim, li keskiya çavên min hatiye. Qene diayên min werin qebulkirin min jêkir û avêt tirba Ehmedê Xanê. Min bexşandin xwest berî diaya xwe, ji ber em hêj ji wî derbaznebûne.

Tonên min derdikevin ronahîyê. Keyaniya min bi eslê xwe spî ye, berî salan hatiye nivîsandin, tê zanîn. Di hemu demên min xezem bi xwe vedikirin de, çavên meytan vekirî, devê wan miftekirî, dixwest bişteqile ji dengbirîna re înyad. Dixwest kilama bêje li deverên pêşî, kilam lê dihatin gotin û bêkûtal. Ê kilam hatin gotin di freqansên qedexê de. Me Penthosu guhdar nekir, wê rojê em gunehkar bûn. Em, pişt re rastî xezebê hatin, di lûtkeyên Sîpan de em ketin cengê bi xwedayên cengê re, me bi jîrbûna Athena şer kir û çend qêrîn ji aşiyê re.

Ez jina Amîdayî me. We, ez weha nedizanîm dizanim. Dê tijî hêrs derkevim lûtkeyên Qerejdax yê herî bilind, xwe dirêjî heftrengiya herî dûr bikim û rengên nû xêz bikim. Ez ê dagerim deştên bêhna şewatê jê difûre , qêrîn biqêrîn bilorînim kilaman ji azadiyê re.

NADO

FEVZÎ BÎLGE

Ne tu kesî xweşikbûn û ne jî gernasbûna wê karibû  
bianiya ziman. Belkî hunermendekî gelek şareza,  
pispore an hunermendekî navdar, navneteweyî hinek  
kêm hinek zêde, di goraniyekê de, an di tabloyekê de  
nêzîkahî lê bikira. Nado keçek werê bû ku, pesin u  
gotin jar dima, li hember wê pakebûn û bedew bûna  
wê.

Nado dilê gelek xortan dîheland, digel ku evîna wan  
yekali dima û mirin bi xwere bianîya jî; Hinan xwe  
kuştin û ji jiyana şêrîn koç kirin, hinek bi çol û  
çepelan ketin, hinek ji wan ketin nexweşxanên dînan  
û nema dengdan, mîna kevirên mermer hişk bûn...  
Qesasê heft mêran bi awirekê wê yê dijwar dibûn  
mîna milyaketan. Derwêşên sond xwarî sond xera  
kirin, bûne gunehkar, di arbaneyên wan de bû  
newayek nemir. Bû têt ji sazên hinan re, xwîn  
dipejîqî ji tiliyan, mîna qurbanan digevizîn û di nava  
xwîna xwe de di fetisîn.

Li ser gora Zînê, Sitî Zûbeyd, Eyşana şeşperî û  
Eyşana Elî Begê kulîlkên rengîn çilmisîn pel  
weşandin, stirî şîn bûn ji kerb û hezdandina pakbuna  
wê.

Qêrîn bi gora Mem, Siyabend, Ferhat û Romeo ket,  
ji hêrsa gazî pêl bi pêl belav bû gihast deryayên  
mezin keştîvanan rota wenda kirin, mîna babilîsokan  
bilind bû gihast ezmanê heftan, stêr rijîyan belav bûn

li ser erdê mezrobotan bûne ax.

Payiza paşî bû, li ser gundê Tilbisim vîzevîza bayê kur bû. Daran pel weşandibûn, rez hatibûn berdan, zeytûn ketibûn birkan, gundî kişiyabûn waran. Li gûnd bêdengiyekê derdor zeft kiribû bêhna evînên mirî hilm diçikand.

Kejo piştî pazdeh salan bi mêhvanî vegariyabû gundê xwe şowaleya wî li piştê, ji bona dîmenên gund çêbike vê sibê ji mal derketibû. Firçe û boyaxên wî di destên wî de di ber qada gund de dimeşiya.

Nado li hespa xwe ya kihêl siwar bubû, li qada gund ber bi çiyayê Tûrcelê ve weke babilîsokê di nava mij û duxanê de ji ber çavan wenda bû. Te digot qey li ezmana difire û xwe ji ewrê spî davêje yên reş bi lez li ser bend û kortalan de di pekiya. Çavên hespê wê wek bizotên agir sor bubû, mîna siwariyên şervan teriya hespê girêdabû.

Nado ji hespê xwe gelekî hez dikir. Ji çend rojan carekê lê siwar dihat bi hev re bi ser çiya diketin. Berî ku here xeml û xişrên xwe yên giran datanî, şal û şapik li xwe dikir, mawîzer davêt piştî xwe cotek rext li nava zirav digeland û bi rê diket, heta berbanga sibê venedigerya.

Vê sibê gava Nado mîna xezebê di ber Kejo de derbas bû, ji heybetan firçeyên wî ji destan pekîyan erdê. Matmayî ma. Pêleyek were sekinî, piştî bi xwe re peyivî... “ Ew çi bû lawo, ew kî bû ? Jin bû,

mêr bû ?

Piştî şaşbûna wî derbas bû, ji derdorê pirsî. Ji wî re gotin ew Nado ye, qesasê heft mêraye. Berê wî got qey Nado mêrkuj e, dûre rastî fam kir. Vegeriya boyax û firçên xwe ji erdê berhev kir. Bi dûv şopa wê ket û wî jî berê xwe da çiyayê Tûrcelê. Demek dirêj meşiya, rapelikî giyaran, xwe li rubaran xist, hilkişiya ser çiyê û li newalê nihêrî, dîmenek gelek xweş mirov mest dikir. Şowaleya xwe û boyaxên xwe amade kir. Li ber xwe raxist. Li dîmenê temaşe dikir lê siwara vê sibehê ji mêjiyê wî dervediket, bi xwe re xeyidî û xwest dest bi çêkirina dîmenê bike, lê dikir ne dikir konsantre nedibû. Çavên hespa wê yê sor hate ber çavê wî, firça xwe danî, bêhnekê rûnişt, li dîmenê dîsa temaşe kir. Dîmen mîna korziyeke bihiştê gelek balkêş bû wek peykerê Rodîn diponijî, di nava xeyalan da tîr bibû. Rûyê wê baş nedîtibû, ji xwe re digot “ heger min rûyê wê baş dîtiba aniha minê wêneyê wê çêbikira. “ Heya roj çû ava serê newalê rûnişt. Li hawîrdorê xwe nihêrî. Di xeyalên tîr de bi hîrehîra hespekê re çeng bû ser xwe. Hesp çav bi wî ket hîriya û rabû ser du niga. Nado mîna serbazekî Romaî li ser hespê hefsar di destê wê de, li Kejo nihêrî Kejo ji wê re biyan hat. Çavên wê weke histirêka karwankuj di berbanga sibê de diçûrisand. Wî tenê li wê dinihêrî. Fitlokek da hespê, rûyê wê hîn baş xuya bû. Bişirî ji rûyê wê şewq belav dibû, weke mirov tîrêjên rojek tebaxê

binihêre çavê wî hêstir kir. Birûskan di mêjîyê wî da vedida.

Bi destê xwe hestirên çavên xwe pakij kir, firkand rew rew zelal bu. Nado hefsarê hespê ber bi şowaleyê ve zîvirand, lê nihêrî dûre dîsa li Kejo nihêrî. Hesp ajot bi dûr ket. Kejo çav jê venediqetand dirêj dirêj lê nihêrî. Çend gur û roviyek li pişt hespê li gor rîtma reva hespê terîkên wan wî alî vî alî dihejiyan. Piştî Nado ji çavan wenda bû, li tûwala xwe vejeriya. Bê îradeya xwe wêneyê wê çêkiribû. Êdî rûyê wê jî baş dîtibû, wî yê wêneyekî wê ji nû da çebikira. Biryar da, xwe da hev berê xwe da gund. Biryar hêsan bû, lê gelo ewê bi karibûya wêneyê wê çebikira ew ne diyar bû baweriya wî ji wî gelek hebû, di wêne sazkirinê de gelek şareza bû, lê mijar gelek zor bû. Bi rê de wêneyê kû ewê çêbike her difikirî.

Kejo xortekî gelek pak û dilsoz bû. Te ruhê wî bixwesta nedigot na, te dil û gurçikên wî bixwesta wî yê bi destê xwe jê bikira û bida te. Dilxweşiya mirovan ji wî re dilşadiyek bê sînor bu.

Êvarê di nava cilan de xew lê xera bibû. Nado ji ber çavên wî ne diçû. Tu qîzikê heta niha dilê wî ew qas ne helandibû. Rabû ser xwe, lampeyê vêxist, çû ber mirêkê, kenê Nado yê bi dizî hat bîra wî ew jî bi xwe keniya. Hinek boyax bi serê pozê wî hişk bibû.

Xwestiyên Nado li ser cilê kêm nedibûn yên kû gelek ji xwe razî ji bona sozekê ji bavê wê bistînin

gelek asê dibûn, lê berxwedanên wan kar nedikir. Bi ser nediket, têk diçûn. Ji hêrsa dilerizîn, lêv û pozên wan dadiliqiyên mîna lalûtan gim gim ji wan dihat, te digot qey aşê avê ne, girêza wan diherikî, kef bi ser devê wan diket, fahş dibûn paşîya situwê xwe dixurandin diçûn.

Hinek ji wan yê kû ji dewlemendiya xwe bawer ji bona timakirina bavê wê digotin çend gund û ne lazim. Bersiva bavê wê jî her yek bû, ne diguherî digot : “ Ez bi Nado nikarim, hûn jî zanin kû Nadoya min ne weke her qîzekêye. Heger bi rastî hûn wê pir dixwazin, divê hûn evîna wê bi dest xin. Ew evîne diparêze, evîn jî ji bona wê jiyaneke azad e.”

Kejo bi hêviya belbî dîsa Nado bibîne diçû çiyê kû li Nado rast hatibû. Heta êvarê, tarî diket erdê disekinî. Carna jî wêneyê wê saz dikir. Di wêneyê de dikir ne dikir xêz diyar nedibun. Nediya bûna rûyê wê, xwestina dîtina wê di dilê wî de hîn zêdetir dikir. Dixwest bi çavê hunermendekî dirêj dirêj têr lê bineheriya. Bi dest nediket, lê wî her portreya wê saz dikir. Nedîbû xeradikir û dîsa saz dikir rûyê wê di mêjyên wî de zelal nedibû weke di ezmanekî ser girtî de mîna heyvekê geh xuya dibû geh wenda dibû. Carna reş carna gewr dibû, diçurisand. Kejo gelek bi wêneyê wê re lebigî. Tiştê kû dixwest zêft nedikir, hêrs bû firçeyên xwe avêt li bin guhê gomeyekî xist, şikiyan perçe perçe bûn. Demek kin derbasbû, xwe da hev, riya malê girt, êdî baş fam

kiribû kû, evîna Nado dil û mêjiyê wî weke gurikê zeft kiribû. Êdî şev û rojên wî li bin guhê hev diketin. Kejo mîna serxweşan dihejiya teyš û gêj dibû. Li jiyana xwe a berê fikirî, ew dema ji wî re çiqas hesan, vala u bê wate bihurîbû. Êdî Nado bibû jiyân, jiyân bibû Nado. Nado huner, Nado rewş, Nado dinya, Nado gerdun, Nado erd û ezman, Nado her tişt.

Ew êdî mîna dihna bi xwe re dipeyvî. Berê digotin min bawer nedikir. Raste ew awirekê bavêje kê ruhê wî êsîr digre, bedena wî dixê nav darên kelepçeyan ji wan re xelasî tune : xelasî gelek car sêdar, guleyek vahşan, xencerek kalanî, tîmarxana dîhna bû.

Gelek roj, meh derbasbûn. Zivistan hatibû. Ji berfê her derê spî dikir. Çûk li hewa hişk dibûn. Reşêleyên koçber li der û berên gund danîbûn. Tava heyvê şevên dûr û dirêj ruhnî dikir. Yê xaniyên wan dilop dikirin li ser xaniyan gundor digerandin û bi lez dîsa dadiketin warên xwe.

Tarî ketibû erdê Kejo rabû ji mal derket. Lingên wî ew ber bi mala Nado ve dibir. Bi rê da poşman bû xwest vegere, mejî û dilê wî bi hev re şer dikirin, wî bi ya dilê xwe kir, meşiya. Ji hewta hewta kûçikan pêve dengê tişteki nedihat, çû bi dizî li ber paca mala bavê wê li taldeyekê sekinî. Şewqa lampeyê dida pacê, perde beradayî bû, siya wê, tenê siya wê xuya bikira bes bû ! Demek dirêj şîpya sekinî betilî li ser

kevirekî mezin xwe da erdê. Şev lê zîzikî bû, çiqas dem derbas bibû wî jî nizanîbû. Qerimî, xwest rabe tevizîbû. Zor da xwe rabû, ber bi mal de vegeriya. Zor xwe gihand odeya xwe kete nava ciyan. Mîna çûkek qefilî dilerizî, diperpitî lihêf kişand ser serê xwe. Dinaliya xew ne dihat, difikirî : “ çî bi serê min de hat. Ez yekî li gor kêfa xwe dijiyam, wê keçikê ez kuştim, jiyana min berovacî kir, weke teyrekî baz ez xistim qefesek pola, ez hêsîr girtim. Ax carekê tenê carekê bi min re bipeyivya bes bû. Hew carekê.”

Wî kar û xebat ji bîr kirbû, nedixwest jiyana xwe yî berê bifikire. Roj derbas dibûn wî tenê wêneyê wê çêdikir. Hîn ne qediyabû, belbî ne dixwest biqede sebrek sermiştû ji wî re. Sibê zû rabû biryar da kû dîsa here ciyê kû li Nado rast hatibû. Alavên wêne û portreya wê bi xwe re bir. Ji mijê rêya xwe zor didît, wî zanîbû piştî mijê ewê dinya veke. Meşîya çû kêleka newalê li ciyê xwe yê berê alavên xwe ji tûrik derxist, şoweleya xwe vekir, portreya xwe li ser danî. Ji serma destê wî firçe nedigirt, hêrsa xwe ji wêneyê wê derdixist hinek rehet dibû. Li der dorê belezîzkekê di nava porê Nado de bicîh kir. Firça xwe paqij kir, rûnişt li dîmenê temaşe kir. Li jêrî newalê siwarekî weke reşahiyekê li ber çavên wî ket. Bala xwe dayê, carna xuya dibû, carna jî wenda dibû. Di dilê xwe da digot : “ Gelo ew ne ew be “ ricifî, bêhna wê, navê wê, siya wê ew diricifand. Hinekî ji xwe hêrs bû. Çima, çima gava wê dibînim



mîna derwêşekî bi cezbê bikeve dihejim. Ew xof, ew tirs ji fikira evînek, mirîzayî bû gelo ? Demek kin bihûrî Nado xuya kir a wa ye a wa ye Nado ! Nado li ba wî bû. Kejo bala wê kişand, wê roja jî dîsa li wêneyê kû saz kiribu nihêrî bû. Meraqa wê zêde bû, hefsarê hespê kişand, hespa xwe ber bi wêne de ajot gelek kûr li wêne nihêrî awirek jî avêt Kejo ! Kejo hîn kej bibû ha wa ye, Nado li ba wî bû girêkek kete qirikê his jê ne dihat tenê ziq lê dinêherî, dinêherî. Rewşa Kejo bi her hawî ew dida dest, Nado fam kiribû peyv hewce nedikir. Wêneyê wê gelek bala wê kişandibû. Çavê xwe ji wê venediqetand. Kejo pekîya ba wêne dirêjî wê kir. Nado hinek sekinî dûdilî bû xweşikbûna xwe di wêne de temaşe dikir. Ji destê wî girt, belezîzka nava porê wê, dûre jî yên li erdê nihêrî, hesp bezand, hinek bi dûr ket sekinî, zîvirî li Kejo nihêrî. Heya niha wê li tu xortan werê ne nihêrîbû. Gelo sipasî an tişteki din bû, Kejo dixwest ya din bû ya. Bi nihêrîna wê weke tîreke leşkerên Medan li navenda kezeba wî bikeve. Wê dîsa hespa xwe bezand ji çavan dûr ket. Erê Nado çûbû lê weke dûrikek dilşewat kete nava rihê wî digerînekên tarî de niqurçk dida canê wî, xwîna wî tevzîk tevzîkî bibû. Di laşên wî da hilnedihat. Nado wêne ji destê wî qebûl kiribû. Kejo gelek bi dilşadî vegeriya malê. Kete oda xwe heya şevê derneket. Li pacê nihêrî serma teres kuliyen berfê dibariyan. Mîna girtiyên zîndana li odê pîkolî dikir.

Tebatî nedihatê di pacê ezmanên segirtî nihêrî stêrk  
jî ne xuya bû kû bi wan re bipeyivîya;  
Evînên navdar kîn ji evîna wî girtibûn, qeşa li ser  
gorên wan diheliyan hêrs dibûn lesar, gor didan ber  
xwe hestiyên mirîyan li ber lehîyan diherikîn.  
Dengbêjan êdî dûrikên li ser evîna Mem u Zîn ne jî  
yên Sîyabend u Xecê digotin. Li ser zarên wan, tenê  
evîna Kejo, evînek zor, zahmet û bê derman  
digeriya. Her dua dikirin ji yezdanê dilovanre.  
Kejo bûyer ji mala xwe re vekirîbû. Bûyer mîna  
pêlên ba pir zû li herêmê belav bibû. Ew ji herêmê  
bûyerek gelek girîng bû. Nado li xortekî nihêrî û  
xelata wî qebul kiribû. Diya wî porê xwe rûçikand,  
kur kir, ber pêxel çirand, ji hêrsa û tirsê sê denga  
lîrand. Guliyê xwe bi dara ziyaretê daliqand.  
Wê rojê dîsa tarî ketibû erdê. Kejo li ber paca mala  
bavê wê sekinî. Ji bayê kur rûyê wî sor, çavên wî  
hêstir fikir. Ba carna bêhna misk û emberê carna jî  
bêhna meytê mezela bi xwe re dahanî. Di wê sermê  
de ji binê çengê wî xwêdan diniqutîn. Şevê ser  
girtî, hîstirek bê çurusk wendabûn. Bi pêlên bayê re  
zûrîniya gûran dihat. Jê pêve li gund weke morîka  
xewên di guhên herkesî de be bêdengiyek her tişt ker  
û lal kiribû.  
Kejo weke dareka gûzê î sed salî li ber pacê sekinî  
bu, tev ne dilivîya. Por û çefiya wî, weke pelên  
darên demsala payîzê xwe didan destê ba. Perde kil  
bû, pace vebû. Nado di pacê de nihêrî, çav bi biryar

bû hêstir hatin xwar ê. Deng nekir. Giriyê wê ji bona çî bû gelo ? Serê xwe hejand, birûyên xwe bilind kir, pace girt, perde berda, çîra vemirand. Kejo tenê zîq lê dinehêrî piştî helwesta wê li himberî Kejo roja din ber êvarî xişir û xemla giran danî. Şal û şapikên xwe li xwe kir. Mawîzer avêt piştî xwe, rext li nava zirav gerand, li hespa xwe siwar bû ji mal derket. Rojek, du roj, sê roj veneger ya. Kejo piştî çuna Nado, qet ji odê derneket. Weke bi janê keve xwe ruçikand. Xwe bi destê xwe xistibû zîndan ê. Perda xwe beredabû odê mîna zîndanên Osmaniya bê hewa reş û tarî ronî qebl nedikir. Piştî demek dirêj ji nişkavde rabu çu ber pacê. Di pacê de çiyayê Tûrcelê bi ezamet xwe di nava mij û dixanê da xûya dikir. Xwe girêda û bi lez ji mal derket meşîya.

ZÊMAR JI HESKÎFÊ RE

FEVZÎ BÎLGE

Delala min, serê xwe yî xwar ê ketî di lepê xem û kovanan de rake, li çavên min binêr e! Dizanim reşexewnan xwe li bedena te î xezalî pêçane. Mîna pelçimên payîzê ên bahozên zalim dikişkişandin, lertzok û tijî tirs î.

Delala min, bêhayîya zarokên xemsar, ji kîna bêdawîbûna hovîtîya dîrokî zêdetirîn janê dide te dizanim. Ku te, dema li çarnikarê dinyayê mirovên din di lepê birçîbûnê, bêavîbûnê de diçingîzîn, te avên herî har lixab dikirin. Zinarên asê, li hember sermayên har te zivirand qesrên bi bilindahîya xwe

qasî asîman.

Heskifa mina delal, hemî wextî ya herî delal tu bûyî. Tu bûyî adan, hêvî, ronahî. Tê bîra te, demekê zarokên esmerên hêrsok jî tu merd, torîna Mezopotamyayê hilbijartin û kevirên mircanî danîbûn ser serê te. Ew roj bi bîra te tê, tu çiqas dişad bûyi? Hate bîra te?

Delalîya te, berxwedanên te, di rûpelên dîrokê de her tim bi tîpên zêrîn hatin nivîsandin. Ne zilma Moxolan, ne jî dek û dolabên Bîzansî nekarîne te çu wextî bixapînin.

Delala min, gêr te heşê xwe hûndakiribe û evan hemûyan jibîrkiribe, ji axê bipirse, bibêje; rast e, min di her biharê de evan çiya bi kûlîlkan xemiland ? li ser xwe çavên almastî, tiriyên hingivîn û xaliyên bi rengê xemrî min dariştandin? Ev hemû rastin ? Ji keviran bipirse, ji zinaran bipirse û bibêje ; ji min heskirina destên hevrîşmi rast e? Sal û deman, ê di seqemê de, di kelwazê de can dayî bedena we î kêmhatî dîtin ez bûm? Bipirse; Heskîf bipirse ! Ger hê jî nebawerbî, ji Dijleyê, ji Feratê, ji Xerzana ku di hemû deman de cînantî bi te re kirî bipirse ! Ji Nemrûd, ji Gabar bipirse, hêjî nebawerbî ji Rojê bipirse! Belê bipirse, şerm meke.

Bipirse , ji her zarokekî tê serdana te bipirse! Ji Zozanê, ji Zergayê, ji şîno, ji Stêra, ji Serhad bipirse! Bila zorê bidin rastgoya ya xwe î zarokî û bibêjin. Û heke tu bawerbî ji wan re bibêje; bese êdî, Ji van

xewên kor hişyarbin, bihiştên derewçîn ên biderew û xapan xeyalî di mejiyê we de hatiye avakirin biherifînin. Bibêje bihişta we ya esîl ev şikeftên min ê hû n dibînin ku hatine wêrankirin e.

Dewlemendiya we ya rast, gencîniya we ya rast ev e. Bêje delala min !

Delala min guhê xwe qenc veke, li min guhdarî bike; tu ciyê hemû cengên başbûniyê, bedewbûniyê serketî û hatî abîdekirin, ciyê cengên nebaşî, neqenci, kirêtî herî dawî binketî yî.

Delala min, tu qet bin neketî, çu demî te zarokên xwe ji talanan re, ji tevkuştinan re nehişt. Lê vêga ditirsî, direcifî. Bedena te ya nazenîn tewixî ye, ne wisa delala min ? Piştî kêlikeke din peraniyên diranpola wê herî har, herî zalim noq bibin û wê bedena te yî nazenîn bişkênin û newqa te yî bi kembera zîvî pêçayî, bikin pare pare. Dê wê bejna te ya dirêj, wê ya fireh û ya sipspî bikujin.

Delala min wê demê, belê wê demê delala min, dê hemû çûk baskên xwe biçirpînin û heta bêdawiyê ji te dûr bikevin. Dê careke din çiyayê te yî ji xecxecokên sor tijî, avên te ên bêhnêrgiz, wê mizgîniya bihara bicoş nedin te. Belê wê mizgîniyê nedin!

Ez te emanetî hêviyê dikim ! Bi xatirê te delala min, Heskîfa min. Bi xatirê te !...

WERGER: Sîmko Hedreş

Çêroka kundekî

Cankurd: [cankurd@hotmail.com](mailto:cankurd@hotmail.com)

Di dîrokê de pir şahên zorbaz hatin û çûn, di zevînê Xwedê de zordarî kirin, mirov kuştin, şar û gund sotandin, êl û malbat talan kirin û li pey xwe rêç û şopên ji xûnê hêştin..gava mera carekê dûroka pêşserên Tirkan bîne bîra xwe, dê xûn di damarên mirov de sar bibe.. û bê guman gotina Xwedayê me yê mîhreban rast e, dema dibêje: "Gava şah ketin gundekî (şarekî) gelaciyê (Fesadê) tê de dikin û seraserên wê bi bin dixînin..". şahên Farisan jî bi zorbaziya xwe fena yên Tirkan namdar bûn û bi hovîtiyeke bînîşe deselatiya xwe ta dawiya jîna xwe digudandin, hetanî ewan jî dihatin kuştin an dihatin çalkirin..Jîna serdestan her wilo bû..Dûrokê gellek li ser zordariyê nivîsandî, lê mixabin! Pir caran jî tersî rastiye hatiye nivîsandin û gellek şahên hov û xûnxwar, pir Zehak û mirovkuj mîna qumriyên aşîtiyê hatine pesendkirin û diyarkirin.. Şehekî Farisan hebû, ku jê re digotin Behram, dibêjin, ku ew ne tenê zodar û sîtemkar bû, ew giha bû wê qonaxê, ku kesekî newêribû ji wî re tişteki ji rindiyê û qenciyê bigota, Eger yekî ji wî re li ser çewtiyên wî gotinek bikira, dê ew yekser bavêtana ber lingên şêr û pilingan an jî bi ganî bavêtana nav agirî an jî di ava kelandî de bikelandana..Ji tirsê re her yek ji endamên malbata wî di xwe de cûm bûbû û mîna pisîkeke newêrek li ber dest û pêyên wî serçemandî, ciyê xwe girtibû û bêdeng ma bû.. Roj

bi roj rewştên nebaş dihatin pêş şahdariya wî, lê ew li ser tevna xwe ma bû û rêsê xwe yê reş dirêst.

Di koçikek seraya wî ya şahani de, şadêrê kenok pêrgî şalyarê mezin hat û silav dayê:

- "Roj baş wezîrê mezin!"

- "Roj baş beqê kenok! Tu dîsa li vir çi dikî? Ma hîn kesek dikare bi henekên te re berken bibe? "

- " Ezbenî! Eger henekên min jî nebin, dê ev netewe di hêstiran de bin av bibe..Ma tu nabînî, ku rû û dêmên şênîyê bajêr çiqas qermiçiye? Ma ji min pê ve kî dikare wan piçekî rûgeş bike? "

- " Ka em bi aliyekî ve biçin, ez dixwazim ji te re gotinekê bibêjim.."

- " Fermû şalyarê mezin, min sed û yek guhên fîlan hene, eger yekî ji wan nebihîst, dê yek ji sedên mayîn bibihîse.."

- " Divê ez lêvên te bi benîştê dara behîvê bi hevdu ve bizemirînim..Tiştê, ku ez ji te re bibêjim bo siya xwe jî nebêje..Eger ji devê te derkeve, bîne bîra xwe, ku hileyê daniyan ji te re amade ye û agirê kutikên sindîganê bi tehn e.."

- " Te ez wilo tirsandim, ku êdî bo min hîç zarok û pişt pêda nabin û dê roja sotandina termê min, kesek ji malbata min tune be, bi ser agirê min de dilopek hêstir birijîne.."

Şalyarê mezin û şadêrê şah bi hev re diçin aliyekî, ku bêdengî û bêlivîn e û li ser du kevirên mermerî rûdinin û bi hev re dirêj dipeyivin..Dawî şalyar vê

dibêje:

- " Ez nizanim ezê çawa şah Behram ji bajêr derxînim û bibim, da bi çavên xwe gund û bajarên, ku kavi bûne bi çavên seriyê xwe bibîne..Dibe, ku bipirse; gelo! Çi bûye, ku van gund hemî vala ne, dîwarên wan herifî ne, kesek tê de najî û zeviyên wan bûne çolên bê berhem."

- " Ne şah berê gotiye: Kî ji min re li ser çewtî û şaşiyên min bipeyive, ezê wî tune bikim.!" şadêre kenok piçekî ji peyvînê rawestiya, pişt re got:

- "Baş e, dostê min î hêja!, ezê îşev şahê xwe wilo bikenînim, ku ew nema dikare daxazeke min ney bike û li dawiyê ezê ji wî bixwazim, ku li gel te carekê ji seraya xwe derkeve û bi te re biçe seyranekê û êdî tu dizanî tu wî kî ve dibî."

- " Min tenê ev ji te hêvî dikir..Va ye salek e ez diponijim, ka ezê bi çi awayî rastiyan ji wî re bibêjim..Van serleşker û serhêzên deselatdar ji nijadê mirovatiyê verê bûne..Her yekî ji wan aliyek ji şahdêrînê standiye, zordariya xwe li gelê hejar dike, xûk û pacê li gor daxaza dilê xwe bi darê zorê dicivîne û ji ber va hovîtiya bêdawî, êdî gundî û cotkaran mal û zeviyên xwe berdane, koçber bûne û nema çi hodeyê ji karê xwe dibînin..Eger ev rewşa han wilo bimîne, dê serpêhatiyeke mezin bi ser me de bê an jî dê lehiyeke ji xeydê text û taca şahê me serbin bike.."

- " Baş e, şalyarê mezin! Ezê teviya mejiyê xwe yê



fêlbaz bi kar bînim û bihêlim, ku şahê me bi şefeqê re pişthesp bibe û berê xwe bide kavilstana te." û li ser wê soz û hêviyê şalyarê mezin û şadêrê kenok ji hev verê bûn..

.....

Şalyarê mezin bi morantiya êvarê re hat eywana padişahê xwe Behram..Gava ji deriyê eywanê ve nêzîk bû, dengên henek û kenînê ji hindir ve hatin guhên wî..Derbas bû hindir û carekê li mêvanên padişahê nêriya, dît ku tev dikenin, hinek ji wan jî pir bi hêrs dikin tîqtîq û yek ji wan jî padişah bi xwe bû û di nav wan de şadêrê kenok fena mîntikekî li orta eywanê bê liv û bê şiv rûniştiye..Gava çavên padişahê li şalyarê mezin ketin bizava xwe kir, ku tiştêkî ji wî re bibêje, lê ji ber kenînê hîç nikarî bû tek bêjeyek bigota, ew bi aliyekî ve gêr bû û destekî xwe ber bi şadêrê kenok ve dirêj kir..şalyarê mezin seriyê xwe carekê li ber padişahê çemand û çû li ser sewkiya bilind li teniştê wî bêdeng rûnişt, pir bi sur û bi çavin tijî xem û histobarî.. Piştî kurte demekê padişah çavên xwe ji hêstirên kenînê paqij kirin û got:

- "Malava! Tu çima zûtir nehat? Eve mirov e an mîntik e? Bi rastî kesek nikare mîna vî mirovî min bide kenandin.."

Şalyarê mezin got:

- "Ez bi hinek pirsên bazarganan ve gêro bûm û lew re ez piçekî dereng hatim, lê ez bi hêvî me, ku hûn

vê derengiyê li min biborînin, şahê min!"

Padişah gote şadêrê kenok:

- "De rabe, here hêlana jinan û van çêrokan ji wan re jî bibêje..û ji bîr meke, ku tu di diravxaneyê re derbas bî û sed zêrê şahanî ji xwe re bistînî, te ez îro pir dilşad kirim.."

şadêrê kenok mîna beqeke avês kire wirq wirq û bi derve de hilgavt û çû..

Padişah gote şalyarê mezin:

- " Ev mîntikê kenok bo min got, ku bihareke çeleng li derveyî bajêr heye û ji min lava kir, ku ez û te herin deştê û bi çavên xwe xemla biharê bibînin..Tu çi dibêjî?!"

Şalyarê mezin têgiha, ku şadêrê kenok kanî bû padişah bida bawerkirin, ku ji bajêr derkeve, lew re di xwe de şa bû, lê şabûna xwe neda der û bersiv da:

- " Bi rastî seyranêke wilo di dilê min de jî hebû, lê min nizanî bû, ez çawa vê bînim zimên..şadêrê kenok dikare hemî tiştan bi asanî bibêje û eve jî kanîneke mirovî ye, ku li ba her yekî nîne..Ezê pir serbilind bim, ku li gel padişahê xwe biçim ger û seyranê di vê biharê de..Gellek beybûn, nêrgiz, gangulî û kulîlkên rengareng li deştê vebûne û dê pir hêja be, ku hûn çavên xwe bi dîdarên wan vehesînin û seriyê xwe bi bihnên wan dagirin.."

- " Baş e! De bila em dakevin nav bax û gulbaxan..ji me re her tiştekî bo gera rojekê pêwîst amade bikin.."

Şalyarê mezin berken bû, ji ciyê xwe rabû û got:

- " Min her tiştêkî bo xweşiyariya padişahê xwe amade dikim.." û ber bi paş ve zivirî, seriyê xwe li ber dergahî ji şah re xwar kir, derket û çû..

Padişah jî bi mêvanên xwe re dîsa ket nav henek û yariyan û ta bi çaxa xewê dilşad û bêxem şevbihêrka xwe li gel pêrewên xwe yên têr û tijî borand.

.....

Bihar e, bihareke ku bi teviya xemla xwe hatiye li wan deşt û çiyên kona xwe vegirtiye, ji Xwedê pê ve kesek nikare ciwanî, lewendî, hêjayî û xweşikiyeke wilo pêda bike, ji rengan, ji babetan, ji bihnan û ji hemî şêweyên afirindan bi hev re ketine hevsazî û hevseriyeke siroştî, ku çi wênekêş nikare wan tevan bikêşe û çi hozanvan nikare van rewştên bala vehûne..Ji rengareng kulîlkan, ji hemî teherên geya û hişîniyan, ji gellek cûrecûre kurmik û buhçikan, û ji pir nijadên firind û lawiran di nav biharê de bi gan û viyan dilivivin, dihejin, difirin an hildipekin..Mêşên hingiv dikin gumgum, bilbil dixûnin, seg direwin û kew jî li çiya dikin qeqeq, bihar jîn e û jîndar hemî di biharê de bizava herheyînê dikin..

Padişah û pêrewên xwe di ber çemekî bi xumxum re pişthesp bûbûn, hespên xwe yên çeleng û bedew hêdîka di kenarê avê re dajotin..Padişah pir bi ger û seyrana xwe li gel pêrewên xwe xweşnûd û dilşad bû, lê belê şalyarê mezin dil bi xem, serî çemandî, bêdeng li rex wî di piştî hespê xwe de venîştibû..

Di wê navê de ew gihan gundekî wêran bûyî, kaviî û bê rûniştvan, kesek tê de tune. Padişah pirsîya:

- " Gelo! Çima ez dengên kur û kiçan nabihîsim, mehmeha berxik û kalîna karikan nayin guhên min? Ev e bû sê gundên, ku ez wan kaviî û bêgundî di rê de dibînim..! çi qewimiye, ku evana ji vira bar kirine û ji ber çi koç kirine, çûne?"

Şalyarê mezin bi nermî bersiv dayê:

- "Şahê min î payebilind! Emê di rêya vegera xwe de hîn gellek gundên wilo bibînin.."

Padişah bêdeng bû û ji xwe re ponijî û hizrên xwe kirin..

Berî êvarê hatin gihan ber gundekî, ku li nêz kelehekê bû, pir ne dûr ji bajêr ve..Gava ew gihan nav malên herifandî û sincên hilweşayî, du kund li ser koşeke kevirî, ku hîn nehatiye xarê li ba hev niştibûn û dikirin kûk kûk..şalyarê mezin, ku ta hîngê mirûz tehl û bêdeng li gel padişahê xwe bû, ji nişka ve kenîya û dengê kenîna wî bilind bû..

Padişah mat ma, li wî nêriya û pirsî:

- " Gelo! Tu ji taştîyê ve ne dilşadî, lê ji nişka ve tu dikenî..Çi heye? Ma tiştêkî seyr hat bîra te?"

- " Na, padişahê min!, na. Ez bi peyvîna van herdu kundan kenîyam.."

- " Te çi got? Ma tu têdigihînî van kundên şikêr çi dibêjin? Min ev ji te berê nebihîstibû.."

- " Padişahê payebilind! Gava du mirov bi hev re pir bijîn, hêdî hêdî pir tiştên hevdu dizanin û hevdu çêtir

dinasin. Êdî hûn li ser min dizanin, ku ez têdigihim zarê kundan jî ..Erê ez têgihîştim van kundên çî ji hev re gotin.."

- "Çî gotin?! Ez gellek hez dikim bizanim van tilûr û firindan çî dibêjin!"

- " Evê aliyê çepê nêr e û ewa aliyê rastê mê ye.. Ewê nêr dixwaze ya mê xwe li mar bike, lê ewa mê minê nake, ji wî dixwaze, ku diyariyeke pir mezin bide wî.."

- "Diyarî?!."

- "Erê. Keçik qelenê xwe dixwaze..Ev pêşxwazî li ba lawir û kotiran jî heye.."

- "Ev tişteki nû ye..De bêj! Te bihar bi min da ji bîrkin.."

- " Kundê nêr bîst gundên şikêr û kavi bûne pêşniyaz dike, ewa mê jî gotê: Ma tuyê bîst gundan ji min re ji ku bînî, kundo? Kundê nêr jî lê vegerand, got: Ma ji gundên hilweşiyayî, kavilkirî û dev jê berdayî pirtir li vê herêmê çî heye, kundê?."

Padişah tê giha, ku pirs ne pirs kundan e û ew serlêdana biharê û seyrana di ber çamê rewan re ji aliyê şalyarê mezin ve hatibû xêzkin, ku padişah bi çavên xwe bibîne, çî bi welatê wî hatiye, di bihareke wilo xweşik û bedew de, ne pezek û ne pezvanek li wan deştan heye..Padişah yekser bêdeng bû, seriyê xwe daxist û hespê xwe ber bi keleha bajêr ve lezand, suwar û pêrewên wî jî li pey wî lez kirin, tenê şalyar li şûn ma, ew ji hespê xwe peya bû,

hevsarê wî ji dest xwe berda û çû ser kaniyekê û av li ser çavên xwe kir, li derdora xwe temaşa kir û berken bû, rûyê wî mîna gupikên dareke behîvê vebû, gulgulî bû, te digot; qey barekî giran ji ser milên wî hate xarê..ewî xwe li ser geya dirêj kir û çavên xwe damirandin.

.....

Piştî wê bûyerê Behram şah ji şalyarê xwe lava kir, ku wî bêtir fêr bike, agahdar bike, ji wî re egera koçberbûna gundiyan ji herêmê rave bike..şalyarê wî gotê:

- "Padişahê min! Gava şahêk lîwana pêrewên xwe ji dest xwe berde, dê ewan şahnişîna wî ji xwe re bikin gola req û beqan, ewan dibin hovên zorbaz..Van serleşker û serhêzan evqas zordarî kirine, xûk û pac ji gundiyan standine, zora wan birine, ku nema ewan dikarin di bin kona te de bijîn, ewana gundên xwe dihêlin û ji şahdêrîna we bar dikin, direvin..Dê rojek bê, li bajêr jî zorbaziya xanedan û malxuran bigihe wê pileyê, ku neyarên we roj bi roj pirtir bibin û seriyê we bi xwe re biêşînin.."

Padişahê xemgîn pirsîya:

- " Baş e, divê ez çi bikim?! Çare çiyê? Rê kijan e?!" Şalyarê mezin dît, ku ew gihaye qonaxeke dûrokî ya pir hêjayê xebateke mezin e û pêwîst e ew histobariya xwe ya zagonî û mirovî bi cih bîne, got:  
- " Şahê min! Bingeha fermanariyê dadiyê, bê dadî jîn reş û tarî ye, zordarî li mirov vedigere û wî bi

xwe re bin ve dike.. Divê şah dadmend bin û nehêlin kesek navê wan an deselatiya wan ji xwe re bike destikê kêrê, bi wan armanc û daxazên xwe yên kesanî bi cih bîne..Eger eve nebû, dê deselatî pir li dar nemîne..Divê hûn ji van xanedan û serhêzan gellek mal û dêrînên talankirî bistînin û li xudanên wan ên rêbazî vegeînin, dê dij bi we rabin, lê rêyek an çareyek dî nîne. "

Padişah piçekî zer bû, seriyê xwe xist nav lepên xwe, bêdeng bû.. Li dawiyê seriyê xwe rakir û bi du çavên tijî hêvî li çavên şalyarê mezin nêriya û gotê:  
- "Dostê hêja! Deselatiyê mirovatiya min wêran kir..Hêza min netewa min kir neyarê min..Ez dixwazim bihara bê dîsa di nav deşt û newalan re bigerim, lê hêviya min ewe, ku hîngê ez kenê zarokan, mehmeha berxikan û xumpxumpa meşkên dewî bibihîsim..Hemî hêza, ku di destê te de bi kar bîne, ku li welatê Behrem şah dadî û mirovatî pêda bibe..Ez vê yekê mîna histobariyeke mirovî davêjim ser milên te."

Şalyarê mezin dilşad bû, çavên wî rohnîtir bûn, berken bû û gotê:

- "Niha ezê bang li şadêrê kenok bikim, ku yarî û henekên xwe li ser van diz û keleşên xanedan ji netewê re li meydan û tratan bibêje..De bila Xwedê we ji me re hezar salî bike, padişahê min!"

Evdikê Tazî

Cankurd: [cankurd@hotmail.com](mailto:cankurd@hotmail.com)

Li ba me Kurdan navpêxistin ji zû ve bûye çandekerê gelêrî, ku ne êl, ne malbat û ne jî kesaniyên namdar ji ber vê yekê qurtal bûne. Gava di malekê de kesekî lingxar hebe, êdî wê malbatê dibe mala Topel an mala Kûto an jî mala Çingil..û her weha..Berê jî carekê ez li ser vê bûbelatê di nivîsekê de rawestiyame, ez di vir de naxwazim pir fireh ducarkî bikim.. Lê werin em binêrin; bo çi navê Evdikê Tazî bi pey Ebdullahê Eyşê xistine, tevî ku ew giremêrekî bi nav û deng e, bi salan û mehan mêr ji ber wî direviyan, xwe di koç û axuran de vedişartin, ne wêriyan li hember wî hîç carekê gotineke dij bi wî bikin..

Li gor devzara kurdî, Evd ji Ebdullah hatiye û (ik) bo biçûkkirinê an jêhezkinê tê gotin..Lê bo çi (tazî)?! Di bin vê peyvê de çêrokek heye..

Da ez her û her Ebdullah nenivîsim, ezê di ciyê wî nave erebî yê dirêj de “bi Erebi: Koleyê Xwedê” Evdo binivîsim..

Rojekê ji rojên Xwedê, germa havînê bû, bayekî agirî bi ser gundê Eso Axa de dihat, êdî kesekî nediwêrî ji siyê biçûya ber royê..Eso Axa jî tev li hinde kesên gundî di odeya xwe de di ber tenê kirasekî sipî de, pişta xwe dabû balifin bilind û guhdariya Evdo dikir..Evdo mêrekî qelew, gir, zikdiholî, simbêlqalind û sermezin bû, di nav gundiyên Eso Axa de kesekî wek wî bi sur tune bû. Evdo gelek salan ji Axayê xwe re li wî dida û li wî



dida, gef û gurr didan gundiyan, bi zorê tişt û pertal ji wan distandin, carinan jî gava Eso Axa li mehîna xwe suwar dibû û bi gundekî ve bo karekî xwe an bi çolê ve bo nêçîrê an seyranê derdiket, Evdo seriyê mehîna wî dikişand û di nav peyên çekdar de wek pêşmêrekî dihat nîşandan. Lew re ciyê Evdo di nav gundiyan ji yên gişan bêtir nêzîk rûniştgeha Eso Axa bû û heger carinan Evdo şaşiyek en gotineke nebaş bikira Eso Axa ji wî bixeyidiya jî, li xwe bêlî ne dikir û ew dibexşand..Gundiyan jî di dilên xwe de diraz “dua” dikirin, ku rojekê Axayê gund ji Evdo bixeyide û di navbera wan de agirek bite dadan, da ewan ji zordariya wî qurtal bibin, hema Evdo hişyar, çî bikira digot: “- Ez bo axayê xwe dikim, ez bo gundê xwe dikim, ez bo mirovatiyê dikim!..”Evdo pir caran xwe wek melaîketan, pêxemberan û ewliyan dida diyarkirinê, lê gava delîve jê re çêdibû, Xwedê me ji zordariya ên wek Evdo biparêzê ! Evdo bi tiliyên xwe yên qalind zikê xwe yê mezin û nîvtazî dixurand û çêrokek li ser mêraniya xwe ji gundiyan re dibêjt: “- Min li wî da û li wî da..Min wilo kir û wilo kir..Min rakir û danî, min bir û anî..Ne ji min ba hûn her wilo jar û ji hevketî diman, ne ez bama hûn tazî û birçî diman û ne ji min ba we nedizanî şev û rojê ji ser hevdu derxin, bê min hûn tune bûn.” .û her wilo.. Axayê wan carcar destê xwe davêt rîhanekî, tayek jê dikir û dida ber pozê xwe û bê ku tişteki bibêje guhdariya Evdo dikir, ka dawiya

çêrokên wî li ku ye.. Eso Axa roviyekî pîr î hişmend bû, bi kevirekî du çûk dikuştin û bi nanekê sê birçî têr dikirin...Gişa dizanî, ku Evdo bê piştvaniya Axê ne tiştek e, lê tev li benda wê rojê bûn, ku rastîniya Evdo wek royê derkeve qad û tratan..Xwedê jî kir, ew roj zû hat..

Li derveyê odayê dengê bilind hat û xortekî panzdeh salî debas bû hinder:"- Esselamû Eleykum, axayê min!"

"- We eleykumselam, kurê min! Çi qewmiye, tu wilo bi lez û hêrsî?!"

"- Axayê min, şivanên Misto Axa li şivanekî te dane, xûn û xirar bi ser çavan de herikîne, dest û pêyên wî şikandine û ew avêtine binê nihâlê, kes nizane ew dijî an dimire.."

Eso Axa piştta xwe rast kir, tayê rîhanê ji dest xwe avêt, sor û mor bû, got:

"- Hîn çi heye? Zû bêje!"

Xort piçekî kekeç bû, dawî got:

"- Misto Axa gef û gurr dane me û dibêje, ku ewê bi suwarî bavêje ser gundê me û Evdoyê Eyşê bi zorê bide ber xwe bibe bavêje binemaxekê an jî du gulleyan bere de seriyê wî..."

Eso Axa pirsîya: "- Kuro, bo çi?! "

"- Ew dibêje, ku Evdoyê Eyşê şivanêd gund hevotine, ku rez û pezêd wî berbad bikin, talanê bibine ser dêrîn û zevînêd wî û rê li peyayêd wî girêbidin, wan bidin bin kotek û lêdanê.."

Eso Axa piçekî germ bû, dîsa pirsî: “Misto Axa çi dixwaze?!”

“- Ew dibêje, heger tu Evdoyê Eyşê nede dest wî, ew kevirê li ser kevirê di gundê me de nahêle..”

Eso Axa destê xwe hejand, xort têgihîşt, ku Axa dibêje: “-Here, bese.”

Gundiyan tevan li çavêd hev û din nêriyan û bi dizîka, di bin simbêl û di nav rihan re berken bûn, li Evdo temaşa kirin, lê Evdo , wek adetê, gava yek li çavêd wî binêre, ew li dîrakan an jî li hesîr û kulavên hindir dinêre..lêvên Evdo yên turimî zer û hişîn bûn..çavêd wî biçûktir bûn..

Eso Axa carekê li Evdo nêriya û ji nişka ve gotê:

“- Evdê mino! Rabe ser xwe û here yekê li bin kehrka Mistik Axa bide, berî ew ji gundê xwe derdikeve, bi ser me de tê û em dibin ciyê yarî û henek û tewzên van gundan.” Evdo vir de wê de nêriya, bêdeng bû.. Mejiyê Eso Axa li hev ket û got :  
« - De binêre ! Çawa şivanêd Misto Axa li şivanêd min bidin ?! Ma ev li çi erdî bûye?! Ma ez ji çi re nan dikim zikê te, Evdoyê min!” Evdo berê azepê mala Misto Axa bû û dizane Misto Axa çi hovekî bêwîcdane, gava Evdo bikeve destê wê rewşa wî nebaş be..

Evdo dît, ku çare tune, rovîtiya gundiyên belengaz di seriyê wî de hişyar bû, got:

„ Ne cil û bergên min çiriyane, Axa! Ezê çawa bi van cil û bergên riziyayî di nav van gundan re herim

gundê Misto Axa? »

« De zû lezkin û Evdoyê min cilkin..Ma hema ez dihêlim, tu wilo bi van cilên kevnare biçî ?! »

Gundiyekek ji cî rabû, bi lez ber bi dolabeke cilan çû, bi zûkî şewlerekî nû, piştêk, kurtikek û çakêtekî hêja derxistin û anîn dan Evdo..Evdo di taldê wî de cilên xwe guhartin, ku çavên Axê lê nekevin û rabû ser xwe, wek xirarekî veniştî li wê ortê rawestiya. Eso Axa kenîya û got :

« - Bi Xwedê, tu xweşpeyayî..Binêre tu bi van cilan çito camêrî.. »

Evdo xaziya xwe daqurtand, êdî nizanî çî bêje.. Gundiyan di ber xwe de kirin gizgiz û lîqtîq.. Eso Axa pirsî: « - De here ! » Evdo piçekî bêdeng ma, pişt re got : « - Ma ne pêlavên min jî çiriyane ! » Eso Axa gote gundiyan : « -Ka pêlavan jî bidin Evdikê min ! » Gundiyekekî hema xwe ji cî hilda û ber bi derî ve çû, dest avêt cotek pêlavên nû û anî danî ber lingên Evdo û got : « - Ma ne pêyên te jî wek ên min in ? Ha ji te re cotek pêlavên nû..Min du mehan bo wan kar kir, lê bila yê te bin.. » Eso Axa kenîya û got : « - Herbijî, peyayê hêja..Te baş kir, ma meyê niha pêlavin nû ji kî derê pêda bikirana ?! Evdikê mino ! De here.. » Evdikê bêçare mayî nedizanî çî bike û çî bibêje..Wek sêwiyekî tirsok bi dilsotin li çavêd gundiyan nêriya û dîsa seriyê xwe berda erdê, li kulav û hesîrên odeyê nêriya..nema tiştêk ji çêrokên wî yên mêrxasiyê tê bîra wî..Wek mirovekî

şêt û dîn carekê ji qirkê ve hejiya, pişt re li xwe hişyar bû, ku Eso Axa li benda çûyîna wî ye..Bi dizîka got : « - Bi Xwedê, Axa, tivinga min kar nake. » Axa kire qîrîn : « - Min çi car tu bê tiving hêştiye ?! Te çima bi zûkî ne got ?! Ka bilezin, bo Evdikê min gelek tivingan bînin, bila bi xwe rahêje ewa bi dilê wî.. »

Du gundî wek şêran ji cî hilgaftin, çûn sandiqek xuşandin anîn li ber kabên Evdo vekirin û hembêzek tivingên cûrecûre jê derxistin û avêtin ber wî..Evdik li tivingan nêriya, tev li ber wî bûn marin reş û devqîç, newêrî bû rahêje yekê ji wan..Hemî gundiyan li çavêd hev û din nêriyan û mat man.. Kanî mêrxasiya Evdo ?! Kanîn wan fort û direwên bêdawî ?! Eso Axa kenîya û got : « -Evdiko ! Te got cil û berg, me cil û berg dan te, te got pêlav, me pêlav dan te, te got tiving vaye hembêzek ji tivingan li ber te..Ma tu dixwazî bimînî ta Mistik Axa bi ser me de ditê û zora me dibe ?! »

Evdik li rewşa xwe ponijî, hizrêd xwe kirin û kesereka kûr kişand, gundî jî bêdeng man bi hêviya, ku Evdik biryara xwe bistîne, li wî temaşa kirin..Pîremêrekî wek min jî di ber xwe hêstir bi dizîka barandin û dilê wî bo Evdo yê Eyşê hat bizdan û di ber xwe de straneke girînî stra..

Di wê navê de hemî nihâl û çiyayên wan derdorên di ber çavên Evdo re beziyan, bi hezaran suwarên çekdar, kuştî, birîndar, Axa û begler, leşker û top û

cebilxane, bombe û firok û dûmanên reş û rengîn,  
giş tev li hev bûn û bi nav zikên hev û din ketin..

Evdik qîriya: « - Ez newêêêêrim..Cilê çî û pêlavê çî  
? Axa, ez newêrim..newêrim»

Ji nişka ve hemî kehr bûn, pî û milên wan tevan sist  
bûn, di odeyê de liv nema, çavên hemiyan bel û beq  
bûn..Eso Axa xûdana ser dêmê xwe bi desmaleke  
zer malişt, bi quncikê çavekî li bejmêra Evdik nêriya  
û bi nermî got :

« - Jê bikin, wan cil û bergên mêran ji vî berdoşî  
bikin, tazî bikin û têtînin ser rêya nihâlê, bila wilo  
tazî biçê û çavên min bila wî carekê din di nav koma  
mêran de nebînin..Tivingan jî li xort û mêran belav  
bikin, bila ewên xudan rûmet hilgirin.. »

Êdî ji wê rojê ve Evdoyê Eysê bû Evdikê Tazî, ji  
gund hat derkirin, careke dî ew pêrgî kesekî nehat...  
çû di nihâlê de berşê bû.

Kefendiz

Cankurd / 2001

cankurd@hotmail.com

Tu li ser çî dipeyivî bipeyive, di nav Kurdan de çêrok  
hene, çêrokên gelêrî, ku li ser wan peyivandinan  
cihê xwe digirin û mirov dikare wan wek paşdîwarên  
bûyeran bibêje..Hinek niviskarên me yê hêja li wan  
çêrokan digerin û dicivînin, ku ji windabûnê  
biparizin û ji pişt û paşserên xwe re wek berhemeke  
gelê xwe yê bêzar bihêlin...Mirovên weha çêrokbêj jî  
hîn di saya Xwedê de mane û bi kurmanciyê

bedew wan çêrokan ji me re dibêjin.

Gava min ji çêrokbêjê xwe re got, ku filan kurê bêvanî wek bavê xwe bûye serokê komarê û li hinek derên din jî kurên serokan an birayên wan dibin serok, ew keniya û ji min pirsîya:- Ma tu çêroka Kefendiz dizanî?!

...û çêrok wilo bû...

Rojekê xortekî hêja, ku bi carekê ziyana wî bi kesekî ne bûye, ji xwe re li nav gundê xwe yê biçûk serîvala û zikbirçî digeriya, dît ku vaye obek mêr diçe mala hevserê wî yê, ku bavê wî berî wê yekê bi hefteyekê miribû, ew jî bi pey wan mêran ket û hezkir bizane, ka ewan çi dibêjin, çi dikin, çi dixun û çi vedixun...Berê jî li gundên me Kurmancan ne pêwîst bû, ku tu bihata dawetkirin, da tu biçûya mala kesekî, hema te xwe hildida û tu bi ser mala tu dixwazî de diçû, te li deriyê, ku her vekirî bû, dida, salamû eleykum û tu diket di nav malê de..Ne wek niha bû, niha mirov deriyên malê xwe li ser mêvanan digirin û hene jî derî ji paş ve bi zincîr û kutikan kilît kirine, wek çawa di bendexaneyê Mezzê de rûniştine, da kesek neyê li ber xewana wan pariyek nê nexe.

Wek adetê jî kesekî ne pirsî, ka ew xort çima bi wan re hatiye, çi dixwaze û çi divêt..Tersî wê yekê, ew ji xudanên malê re wek alîkarekî baş hat dîtîn, yekser bi wan re berdestiya mêvanan kir û bi mêvanan re jî firavîna xwe xwar, ku jê re Heftek dibêjin gava piştî

mirina yekî bi heft rojan xwarinek bo serîxweşkiran bite dayîn. Paş xwarina Heftekê, meleyê gund destê xwe da ber kehrka gunhê xwe û çend ayet ji Qurana pîroz bi dengekî xweşik xwendin, agir berda kezeb û dilên mirovan, ji tirsê sohtîne di agirê dûjehê de hinavên hatin pizdan..Dawî destên xwe bi ezmanan de rakirin û vekirin, dest bi dirazan (Duayan) kir, Fatîhe jî bo ruhê miriyê malê xwend û bi wî re teviya mêvanan Eşhedullah kirin û bi kefên destên xwe dêmên xwe maliştin, ku wan dirazên xêrê û dilovanî xwastinê, bo wan jî bi cih bîn. Xortê hêja jî wek wan kir, bê ku baş têbigihe, ka mele çî got û çî ji Xwedayê gewreban xwast. Lê ew serohateke baş e di nav Kurmanca de, ku bi ser hev û din de rojên mirinê dicin û tên û neyratiyên nav xwe di wan rojan de ji bîr dikin, ji hev re gellek neqenciyan dibexşînin..

Mêrekî, ku bi kumekî sipî û tentenî bû, gote mele: - Heyran! Ma tu dirazekî bo ruhê diya min jî naxwênî, ne ew jî berî niha bi du hefteyan çû ser dilovaniya Xwedê?

Mele destên xwe dîsa vekirin û got:

- Fatîhe bo ruhê diya birayê me yê kumsipî.

Gişan bi hev re gotin:

El-Fatîhe

û bi dizîka di ber xwe de kirin pispis, Fatîhe xwendin û eşhedullah kirin û destên xwe di ser rûyên xwe re gerandin. Dilê mêrikê kumsipî xweş



bû, çavên wî çirisîn, wek çawa hêviyeke mezin ket hinavên wî...

Hêdî-hêdî daxwaz pir bûn û her yekî ji mêvanan ji mele xwast, ku bo merivekî wî yê mirî, Fatîhe bite xwendin..Ji xwe gava mirov Fatîhê bo miriyekî dixwêne, li dawiyê dibêje:

- û bo ruhên miriyên giş cemaetê..

Lê carekê mêrikê kumsipî daxwaza xwe ji mele kir û wek dixuye dexsînî (hesûdî) ket dilan û ewên din yek û yek xwastin, ku ji wê qencyê û bi bîr ve anîna miriyan, bêpar nemîne.. Êdî mele bê ku bipirsin jî amade bû dilên wan şa bike û ew kar jî histobariya wî ya olî û civakî bû..Mele kêmanî ne kir, û zincîra bi bîranînê gerand û dirêj kir, navên miriyên gund, ku di wê sale de miribûn, tev anîn bîran û Fatîhe ji wan re xwend..Tenê li ser bavê xortê hêja Fatîhe ne hat xwendin...Xortê hêja ji xwe re got:

- Dibe mele ji bîr kir..!

Wilo ber dilê xwe av reşand, lê bi rastî çawa gişan ji bîr kir?! Ma hîç bavê wî ne hat bîra kesekî ji gundê wî?! Ewî jî dixwast, ku ji mele bipirse, lê di wê navê de kesek bi wê ortê ket, silav da û gote mele:

- Seydayê hêja! Rabe here hinek ji dûr ve hatine camiyê, ku te bibînin..

Xortê hêja li pey mêvanên, ku yek û yek belav bûn û çûn, ji wê male derket û bi dilekî xemgîn û tijî keser seriyê xwe kir ber xwe û çav tijî hêstir ber bi zinca xwe ve zivirî...

Wê şevê xew ne hat çavên wî, gellek pirs di seriyê wî re beziyan û li hev geriyan, bûn topaçek wek deziyê giloka pîra tevnekar, ku nema çavên wê dibînin. Di xewê de bavê xwe dît, ku bi tenê xwe li çolekê digere, dûrî civatek mêran, ku giş bi hev re dikenin û dipeyivin, ew ber bavê xwe diçe, bavê wî bi destê xwe ney dike û wî qorî dike, naxwaze kurê wî ber bi wî ve biçe..

Xort bi berbanga sibê re ji nav cî û nivîna xwe rabû, diya wî li wî temaşa kir û têgihîşt, ku kurê wê xewneke ne xweş dîtiye... Di ber taştîyê re ji wî pirs kir, ka çima wilo xemgîne! Kurik gotê, ku wî bavê xwe di xewnê de dîtiye û ji wê re bûyera Hefteka li mala hevserê wan anî zimên. Diya wî keserek kişand û gotê:

- Kurê min î delal! Bavê te ji bîr ne kirin, lê ne xwastin bo ruhê wî Fatîhê bixwênin!

- Bo çi? Ma bavê min mirovekî nebaş bû?! Ma çi ziyana wî bi xelkê bûbû?

- Ezê bo te bibêjim, lê divê tu pir nexeyidî..Heger tu îro ji min nebihîsî, tuyê rojekê ji devê xelkê bibihîsî û hîngê tuyê bitengijî û ji min pir nevîn (kurh) bikî.. Kurê min î hêja! Bavê te yê rehmetî Kefendiz bû.

Xort yekser veciniqî, wek çawa tu satilek ava germ ji nişka ve bi ser kepîra wî de boş bikî..Ew germ bû, tevizî, dilê wî bi lez lê da, zimanê wî li hev geriya, bihn û solîqa wî teng bûn, kir kufkuf û pufpuf, lê çi hode?!

- Bavê min dizê kefenan bû?

Diya wî destê xwe di ser porê wî yê reşik re gerand,  
seriyê wî kir hembêza xwe û gotê:

- Kurê min! Tu dibînî em belengaz û bêzarin..Me ne dêrîn (mulk) û ne zevîn e..Piştî bavê te di karê mala axê de tewiya, lê dîsa jî bi zor me dikarî nanê xwe di şîrê germ de şil bikira û ji şîr pirtir jî li nav malan tune bû.. Bavê te ji hejarî û bêçariyê bû diz, malê xelkê, ku ewan jî hejar bûn, didizî, dibir li bazarê difiro, ku em debara xwe pê bikin. Dawiyê jî hişê wî tev li hev bû, êdî nedizanî çî bike, çîma wilo dike...Xwedê dizane wî carekê an du caran bi şev gor û çalên miriyan li goristanê ji nû ve vedan û kefenên miriyan dizîn û gava gundî li wî hişyar bûn nav li wî kirin: Kefendiz.. Bo çî kefen diziyar ta niha kesek nizane, lê ew bû kefendiz...

Kurik bihekê bêdeng bû û pişt re pirsîya:

- Bavê min çî mirov bû?!

- Bavê te mirovekî hêja bû, lê tevî wê jî ma belengaz û hejar..hejar û belengaz jî mir û bi ser de jî navê Kefendiz li şûn xwe hêşt.

- Bo vê kesek Fatîhe ji bavê min re naxwêne?

- Erê, tenê bo vê yekê ne xwendin û naxwênin..Kurê min! Divê tu karekî baş bikî, ku xelk wê yekê ji bîr bike û ji bavê te re jî Fatîhe li cemaetan bite xwendin û rehme jê re bite xwastin...

- Ez dikim, ezê karekî pir baş bikim, ku xelk kefendiziya bavê min ji bîr bike û ji wî re Fatîhê di

rojên Heftekan de bixwênin..

Dayik û kurê xwe ji hevdu verê bûn, lê dil û seriyê kurik tijî hizr û xem bûn. Ew gellek rojan bi tenê xwe di siya dareke merxê de li çiyayê, ku li hembera gund bû, rûdinişt, dihizirî û bi xwe re dipeyivî..Ka wê çî bike, da xelk Fatîhê bo ruhê bavê wî jî bixwênin!?

.....

Ber destê sibê bû, morantiya aso hîn hebû, gundiyekî navsalî di nav gund re bi hêlehêl û qîreqîr lez dikir û ber bi camiyê ve diçû û digot:

- Xwedê rehma xwe li Kefendiz bike. Gundîno! Hawar! Zû werin, bibezin..lez bikin! Ez niha ji nav goristanê têm, hûn bawer nakin..Ne tenê kefenê miriyê me hatiye dizîn, termê wî jî tune ye..Ev çî ye, ev çî bela hatiye seriyê me?! Kefendiz mir, lê niha dizek pêda bûye, term û leşên miriyan didize..

Mele jî derketibû, ku banga sibê bixwêne, gava qîreqîra wî mêrikî bihîsiye, di nerdewana minareya camiyê re hildikişî û di ber xwe de digot:

- Raste! Rehme li kefendiz be..Divê em Fatîhê ji wî re bixwênin..Ev çî bobelat bi ser me de hat, niha termên me jî tîn dizîn..Ez dibînim nanê min li vî zevînî nema, ezê ji vir bar bikim herim warekî din, qe nebê ez mirim, term min naye dizîn.

Kerfiroş

Cankurd / 2002

Di va dema navguhartin û rengguhartinê de çêroka

erebî ya bi navê “Sola Ebûl-Qasim El-Tenborî” tê bîra min, lê ezê ji we re vê carê çêroka wan mirovên kurd bibêjim, ku kerê wan li seriyê wan bûbû bela û nema dizanîn çî bikin, da xwe ji kerê xwe verê bikin..

Rojekê evdalekî Xwedê kurîyekî biçûk bi destmaçîkirinê ji axayê xwe, Misto axa, stand û ji ber ku ew hejar û belengaz bû, ji ber tengiyên jînê û ji ber destdirêjiya bav û bira û bi taybetî ya dayika wî, ku wek evdal bi xwe li ser wê gelek caran gotiye; ew ne jin bû, ew mar bû, dev ji gundê xwe berda û koç kir gundekî ji gundên Misto axa..Li wir tenê rêyek bo jînê li ber wî ma, ew jî kar û xebata di nav zevî û dêrînên xelkê de. Bo vê yekê pêdakirina kurîyê biçûk ji wî re piştvanîyeke mezin bû di tehlêjînê de û di wan rojên reş û tarî de, ku bira nanê xwe ji birayê xwe vedişart û du derax mirovatiyê hebûn, yek bo maldaran û ya din jî bo hejaran, maldaran bi darê zorê hejar hîn hejartir dikirin û teviya femandariya zorbaz jî li gel wan bû..

Evdalê Xwedê bi miqayîtbûn, bi teviya kanîn û hêza xwe û bi alîkariya bindeyên axayê xwe kurîyê xwe tîmar kir û roj bi roj xurt kir, kir kerekî Tatan. Kerên Tatan wek xudanên xwe bi kar û hilgirtina barên giran namdar bûn.

Demek derbas bû, kurîyê me bû kerekî gir, pir bi hêz û navdar bû..Evdalê Xwedê bi piştvanîya kerê xwe yî, ku navê (Kerşêr) lê kiribû, jîna xwe çêtir kir,

navê xwe belav kir, û gava di nav Kurdan de piçekî mal û hêz û pereyên te hebin, êdî tu zanayî, tu hişdarî, tu merivê hêjayî, tu axayî, tu....

Gava yekî bixwasta keviran bo malavakirinê bîne, deng li evdalê Xwedê dikir, wî jî kerê xwe dibir û kevirêd wî bardikirin, wilo jî gava rakirina şixreyan an şilîfên tirî an jî çûyîna ber aşan ba, evdalê Xwedê û kerê xwe her di berdestiya xelkê de bûn. Ji bo wê yekê jî evdalê Xwedê û kerê wî di nav her warekî de bi rêç û şop bûn, çalak û jêhatî bûn.. Evdalê Xwedê jî êdî kerê xwe dipesinî û xwe jî li ser pişta xwe hîn bêtir dipesinî, her digot: “Ez û kerşêr, kesek ji me bi hêztir li cîhanê nîne, kesek nikane zora me bibe..” Bi rastî jî ew ker bi hêz bû, bi kêrî her barekî û her hilgirtinekê dihat, di demeke kin de wek şêrekî hat nasîn. Lê belê tenê du asteng li hember evdalê Xwedê hebûn, ew bi xwe nezan bû, zimantûj û serhişk bû, û kerê wî jî pehîn davêtin, xelk gesdikir, bar ji ser pişta xwe davêtin, hildida çîza û pir caran jî li çarexa (dora) xwe zîyanin mezin pêda dikirin, tişt û pertalên xelkê dişikandin û bi seriyê xwe li vî alî û li wî alî dida, bi çeng û bêvilên xwe li bin zikê zarok û jinan dixist, ewan birîn dikirin. Evdalê Xwedê ji ber çîzavêtinên Kerşêr bi xelkê re ketibû pevçûnan û pir caran hêriş dihatin wî..

Rojekê Kerşêr dev avêt zarokê Misto axa, cilên wî bi diranêd xwe yê tûj çirandin, pehînek li devê wî da û du diran di devê wî de şikandin, zarok di heriya golê

binê gund de gevizand..Misto axa pir xeyidî û ji hiş çû.

Evdalê Xwedê dizanî, ku kerê wî, an jî ezeziya wî çi bela jê re anî, lê dereng bû..dît ku rewş wêran e..lingino qurban! Ew reviya, xwe avêt bextê hinek axayên din, lê axayêd wan çiyar tev ji wî û ên wekî nevîn dikirin, kesekî ew ji Misto axa ne parist.

Misto axa merivêd xwe hinartin, li wî geriyan, ew li paş heft çiyar girtin, bi gurmistan bi ser wî ketin, dest û pêyêd wî girêdan û ew bi xwe re birin, avêtin binemaxekê.

Evdalê Xwedê sed sûnd bi çar qulbeyan xwar, ku ew ne sûcdar e, û Kerşêr ew “Bêmirovatî!” bi serê xwe kiriye, wî ker honekiriye çîzavêtin û devavêtinê, lê Misto axa ji wî bawer ne kir û li wî zor kir, ku tiştêkî bîne serê kerê har.. Evdalê Xwedê pir li ber wî geriya, ku wî ji zindanê berde, êdî ewê peyatî û azepiyê ji malbata Misto axa re bike û ewê bibe yek ji parêzdarên tifka mala Misto axa, hema çi hode! Misto axa mirovekî pir bê wijdan e, gelek zorbaz e...

Evdalê Xwedê nûçe gihandin birayê xwe, ku rewş ev e, û pêwîste tiştêkî bîne serê Kerşêr, da dilê Misto axa piçekî nerm bibe, û dibe ku wî azad bike.

Birayê wî, ku hîn ji wî nezantir bû, bawer kir, ku eger ew tiştêkî bîne serê Kerşêr, dê birayê xwe ji wê tengiyê qurtal bike. Yekser civatek çêkir, hinde dost û hogirêd xwe civandin û bi wan re li ser vê yekê

peyvî, pir peyvî..

Hefteyekê, du hefteyan azar û gef û gurr dan Misto axa û gotin:”Emê mala te bisojin, emê xan û eywana te wêran bikin, emê zarokên te bikujin û emê wilo bikin û bikin..”

Lê çî bersiv baş ji aliyê Misto axa ve ne hat û ji wan gef û gurran ne tirsîya..Rabû ji neçarî kerê birayê xwe li pey xwe kişand, bir bazarê, ku bifiroşe û Misto axa agahdar bike; va ker çû, hat firotin...Lê mixabin! Kesekî ew ker ne kirrî ji ber ku nav û dengê wî belav bûbû, ku bi rê ve çîzan dide xwe, bi xelkê digire, bared, ku lê barkirine, ji ser piştta xwe davêje û weku har û şêd dixuye..Pir poşman ji bazarê vegeriya û kerê birayê xwe jî bi xwe re anî mal.. Dîsa deng li hogiran kir, ka çare çîye?!.. Pir xwehişî kir, lê hîç rêyek ne dît..Rabû merivekî xwe hinart ba Misto axa û gotê rewş ev e, fermana te, axayê min, çîye, em pê xweşnûd in..

Misto axa bersiv da:

“ – Divê ev ker ji vê teherê bite derxistin, navê wî jî bite guhartin û divê ji mîyan aştîxwaztir û hêmintir be, eger careke din dev bavêje kesekî, divê hûn yekser bikujin..”

Hişdarên, ku hîn dilsozên evdalê Xwedê bûn, li hev rûniştin û piştî gengaşî û dan û stnadineke dirêj, gihan wê biryarê, ku Kerşêr têxînin axurekê, wilo lêbidin, birçî bikin, bigevizînin û binzor bikin, ta ew jar dibe, pirça wî diweşe û pişt lê dişike..û bi rastî



kerê, ku wek qantirekê gir û bi hêz bû, di demeke kin de wilo jar kirin, ku êdî xelkê bawer ne dikir, ew Kerşêr ê evdalê Xwedê ye..Li wî dan, birçî kirin, merixandin, gevizandin, zor lê kirin û nehêlan raze, ta ew bû tişteki din..Li dawiyê ji axurê derxistin, wek çawa ji nû ve hatiye tîmarkirin..Pirça wî jî cîlaw kirin û rengekî çîl û zer danê, ku hema-hema wek miyek dixuya û bi ser ve jî navê kerê xwe guhartin û ji wê rojê ve nav lê kirin: Mîker.. Birayê evdalê Xwedê nûçeya tezekirin û nûkirinê gihand Misto axa û jê tika kir, ku birayê wî berde, lê Misto axayê dilkevîr bersivê hêja neda û got, ku ker ew ker e, navê wî jî ne giring e, reng û pirça wî jî bo min wek hev e, heger ez birayê te berdim û li ser piştê kerê xwe suwar bibe, dê bo min binketinek mezin be, û dê bi derketina xwe ji nav lepên min wek qehremanekî bite nîşandan, ez jî ne amade me vê yekê bipejirînim..

Ew mijar pir mezin bû, çû ber dadgehê jî, û axayên din ên li çarexa gundên Misto axa jî xwe bi vê yekê gêro kirin.

Li dawiyê hişdarên gund nikarî bi civata maldar û axayan bidin pejirandin, ku ev Mîker ne Kerşêrê berê ye û ev rewş rewşeke nû ye, teherekî tazekirin û nûkirinê pêda bûye.. Misto axa jî evdalê Xwedê berneda ta Mîker nexweş ket, hestiyêd wî zer bûn, pirça wî tev weşiya, hêza wî nema, rohaniya cavêd wî vemirî û ew bi hejarî û belengazî li paş malan ket û

can da...

Mêrkê Hopel

Cankurd: cankurd@hotmail.com

/ Çileyê pêşîn 2000

Li ba gelên europî wênekariê pêş ketiye û hinde kes bi wênekêşê pir namdar bûne..Li ba me Kurdên çiyayî û mebesta min Kurdên herêma Kurdaxa li rojavayê welêt gellek kes bi hunera pêdakirina navan namdar bûne.. Gava porê mirovekî hinekî kêmbê, wî bi Kêlo nav dikin, gava piçekî wek min kin be, bang lê dikin: Kino! Û zarok jî bi pey wî dikevin û jê re dibêjin: "Kino! Navê xwe li mino!". Û gava yek piçekî bikule, jê re dibêjin: Kulek an jî Kûto!.. û her weha..Eger ez van nimûneyan bînim zimên, dê çêroka Mêrkê Hopel tew ji bîrana me derê.. Navê wî Simo bû, Simo jî kurtiya Îsmâîl e, Îsmâîl kurê pêxember Îbrahîm bû, ku Kurd dibêjinê: Îbo. lê tew navê Simo yê rastîn nedihat bîra kesekî ji daniştvanên gundê wî, ku navî wî jî ne mîna yê gundan bû loranî jê re digotin: Şeş Tira..Çima şeş tir, kê wan tir kirine, çêroka wê çiyê, bi Xwedê ez nizanim..û bi erebkirina navên kurdî û navên gundên Kurmancan, ew çandeya me jî tev li hev kirine û dixwazin ji ortê rakin.. Simo mirovekî wilo livgiran, xwe tev li civat û kar û barên kesekî ne dikir, sî salî bû û hîç bi kesekî re ne ketibû giregir û kewkewê, bi berbangê re diçû kar û kispê xwe û bi êvarê re vedigeriya mala xwe..wek

dibêjin: Ne li xêra xelkê, ne li şerê xelkê..Hema mirovên wilo jî hişmend, dilpak û bi kefteleft û karê xwe ve mijûl û gêro ne , di nav civata me Kurmancan de ciyê rexne û dexsînî û nevînê ne.. Gava zimzan "zivistan" bihata, ew li quncikê pixêrekê ta dema xewê bi tenê xwe, an jî li gel dayîka xwe ya pîr rûdinişt, lê gava havîn bihata, ew li ser sewkiya "panela" pêş mala xwe, di nav rîhanan de rûdinişt, piştî xwe dida du balifên giran û bilind û ji xwe re dihizirî..Ew pir kêr diçû nav gund an bi kesekî re şevbuhêrk derbas dikirin, lê dîsa xelk ji wî nedigeriyan, tinazî û yariyên xwe bi wî dikirin.. Kesekî gund jî her û her ji dûr û nêz ve li wî temaşa dikir û dixwast navekî ji wî re pêda bike, ku hîç ji bîr nebe..û ji ber ku Simo gir bû, seriyê wî dirêjokî bû, pozê wî mîna nikilan bû û salê carekê an du caran li nav gundiyan dixuya, ew kesê bi navlêkirinê jîr û kêrhatî bû fena Pecaso an jî Leonardo Da Venchi bi wênekêşiyê, li civatekê, ku Simo jî hatibû li aliyekî bêdeng rûniştibû, carekê kûr û hûr li Simo temaşa kir û got:

"- Bi Xwedê Simoyê me mîna Hopelekî di ciyê xwe de guh li xwe dine.."

Te digot, qey yekî dest bi kilamê kir, di cî de hemî bûn guh û berê xwe dan navlêkirê xwe..Gellek bi hev re kenîyan û bû tîqtîqa zarok û jinan..Hopel..?! Çendekan bi hev re gotin:

"- Welleh te li ortê xist..! Hopel bi xwe ye.."

Yekî got:

"- Lo min her digot: Ev mîna kewekî dixuye, lê ya te rastir e bira, ev mîna Hopel e, piçekî girtir e ji kewî.."

Pîremêrekî rîsp tûre bû, rabû ser xwe û got hemiyan:

"- Ma hûn ji Xwedê natirsin?! Ma ne di Quraanê de hatiye, ku nabe mirov navên naxweş bi pey hev û din xînin?..Hûn fedî û şerm nakin? Hûn çî ji mêrkê hejar û reben dixwazin?!"

Kesekî henekvan û zimandirêj got:

"- Erê wilo ye mamo! Lê me çî gotiye? Ma nav ji navê Hopel xweştir heye?! Qeyne me nav lê kiriye: Kero, Guro, Maro, Qantiro..! an jî me gotiye: Kûro! Zimanlalo, Pirço!.."

Yekî bersiv da wî, got:

"- Bese devê xwe bigir Devqulo!"

Pîremêr dît, ku evana guh nadin gotina wî, derî li pey xwe lê da û çû ser oxira xwe..

Wê şevê Simo, mîna yek di civildana tirî wer be û civildar yekûyek pê lêkin û di nav çop û şerbeta tirî de bite gevizandin..Her yekî ji aliyekî ve deng lê kir û hinekan rewşa firindan anîn zimên û hinekan piyên xwe mîn hopelan bi xwe ve zemirandin û xwe di nav komê re livandin û Simo jî tew dengê xwe nekir, hêdî-hêdî ji ciyê xwe rabû û ber bi mala xwe ve çû û di ber xwe de got:

"- Hûn rast fedî nakin.."

Êdî navê

Simo bû mêrkê Hopel, Hopel vir de! Hopel wê de!..

Roj çûn û hatin, diya wî jî, ta roja koçkirinê ser dilovaniya Xwedê, j i kurê xwe re digot: "- Hopelê min!.."

Lê ev navê, ku bi rastî bi zanatî û jêhatî lê kirine, bû egera, ku çî keçik bi wî razî nebe, her car dema diçû destê yekê dixwast, ji keçikê re digotin:

"- Kurê! Tu yê çawa Hopel bikî, ma tu nabînî, ew rast mîna hopelan e.. tenê du basik jê kêmin, berê nikilê wî heye.."

Ji ber wê nerindiyê çend salan Hopel bê jin ma û dilê wî li jinebiyan nebû, wî dixwast keçeke mar nekirî ji xwe re bîne, ne jinebiyekê..

Hopel ji dostekî xwe yê pir nêz pirs kir:

"- Gelo! Ji min re bibêj, ez çî bikim?"

Dostê wî yê dost gotê:

"- Çêtir e ji te re, ku tu bar bikî, ji vir herî gundekî dût, ku kesek te li wir nanase, ji xwe kesekî te li vî gundî nemaye û zevînên te jî ne yên xanedana ne..Bifiroş û ji vir here.."

Bi rastî jî hikariya dostê wî lê bû û lew re Hopel di demeke kin de ga û çêla xwe, ker û bizinên xwe, xanî û zevînê xwe firotin, pereyên xwe berdan berîka xwe, seriyê xwe rakir û di tariya şevê de çû, ne kesekî dît û ne kesekî bihîst ew kî ve çû..yekî got:

"- Li gorî zanîna min, Hopel ber bi bakurê

Kurdistanê ve çû, li wir hinek merivên diya wî hene.."

Yekî dî got:

"- Ewê biçe Helebê, çend mehan wan pereyan li qehbik û orispiyan bide, gava berîk vala bûn, wê dîsa vegere gund..Ma ne hopel jî salê carekê li van deran diyar dibin û pişt re winda dibin.."

Lê Hopel ne ew kesa bû, ku biçe pereyên xwe li pîsîtiyê bide an jî karibe li Helebê bijî, ciyê gemar û hejariyê, bajarê qerêj û bêkariyê, ku bihna coyên pîsiyê pozên mirovan disojin, ji qonaxên bilind ve bi şev tûrên gemarê davêjin xarê û ji dest cendirmeyan hejar û belengazan nikarin karekî xwe bê dayîna bertîlan bikin..Koçkirina ji welêt, bo Bakur an Beyrûtê an jî Europa hîç ne di deftera wî de bû..Ewê bihîstibû, ku Kurd li Kobaniyê hinekî ji Kurdên Kurdaxa bêhtir payebilindiyê ji hev re dikin û di nav wan de hîn siniçên êlên Kurdan mane û bi ser van tiştan ve jî, kesek li wir nizane ew kî ye û ji kî derê ye.. Biryara xwe da û bi cih anî, ew çû Kobaniyê.. Li herêma Kobaniyê bi Kurdî dihat peyivîn, dilê wî şad û tijî xweşî bû, ku li wir bi zimanê xwe dikare li gel hemiyar bipeyive, hîç pêdiviya wî bi Erebî tune.

Dest pê kir, ji xwe re li bazarên bajêr hûr û pertal kîrîn û firotin û hêdî-hêdî şênîyê bajêr nas kir û wan jî ew naskirin..Lê navê xwe yê rastîn û yê lexem jî ji kesekî re negot.. Ji ber ku li hotêlan nasnameyê ji mêvanan dixwazin, ew tew nediçû wan deran û ji xwe digot:

"- Ta zivistan bê, ezê malekê kirê bikim, û rojekê bê, ezê keçeke şîrhelal ji xwe re bînim."

Hinde caran jî direweke xwe ya biçûk dikir, digote Kobaniyan:

?- Ez ji bakurê Kurdistanê reviyame û mişext bûme..lê ezê piştî demekê vegerim welatê xwe.."

Kobaniyan jî, Xwedê ji wan xweşnûd be, bi rastî gava kesekî bakurê welêt dibînin, pir berdestî wî û alîkariya wî dikin..

Rojek ji rojên Xwedê hevkarê wî yê bazarê, ku roj bi roj hevdu didîtin û bi hev re destbiratî bi zûkî pêda kiribûn, ji wî re got:

"- Were bi min re em herin gundê me, ezê te bi xudanên xwe, bi dost û gundiyên xwe bidim nasîn, tuyê ji wan hez bikî û ewan jî dê ji te hez bikin..Ma qey em her wilo bi tenê li bajêr dimînin?!.."

"- Bira! Bihêle ez li vir bim, lê gava tu vegerî, ji comerdiya xwe ji min re piçek savar bi xwe re bîne, min bîrê kiriye.."

Dostê wî jê negeriya û ew bi zorê li gel xwe rakêş kir, bir..

Êvar hat mala dostê hêja bû eywana axan, ji her aliyekî gund ve peya hatin, ode tijî bû, hinekan cigare dikêşan û çayê qurt dikirin, hinekan dipeyvîn û hinekan jî palda bûn, te digot, qey ewan li malên xwe hilketine.. Xudanên malê jî bi rastî hîç kêmanî di mafê mêvanên xwe de nekirin..Lê mêvanê nû

nikarî bû tev li axiftin û şevbuhêrka wan biba, yek: ji ber ku ewî kesek nedinasî û nizanî li ser çi mijaran dipeyivin û yê duwê: Ew bi xwe wek berê me li ser gotiye; piçekî xûnsar bû, ne dikarî bi zûkî tev li civatan biba û ciyê xwe di nav de bigirta..

Mirovekî navsalî, ku destê xwe xistibû bin guvêşka xwe, li ser aliyekî palda bû, cigare di dêv de û tizbiya xwe ditizband, egala seriyê xwe jî mîn a ya mîrekî Ereban bi ser biriyên xwe ve daxistibû, çavên xwe kûrik kiribûn û li mêvanê malê temaşa dikir, bêdeng û bêliv. Piştî gavekê ji şevbuhêrkê got: "- De hele hiş bin lo! Bila em guhdariya mêvanê xwe jî bikin, ew çi kese, ji kî derê ye, navê wî çiyê û çi li ba wî heye û çi tune ye..ew werganî bi tenê li aliyekî ketiye xeyalan"

Hemî ji peyv û axivan rawestiyan, firfirta çayê jî nema, tenê dengê çeçqeça tizbiyên wî mêrkî dihat guhan, li hêviya gotineke mêvanê malê bû.. Lê mêvanê hêja tew nizanî bû çi bibêje, zimanê wî hatibû merbendkirin, hatibû birrîn.

Li nav ciwanan bû pisepis, lê kesekî bi dengbilindî tişteke negot..Gava mêvanê malê wilo bêliv û bêşiv ma, wî mêrikî xwe rast kir û got:

"- Ma evê çi bêje?! Qey hûn nabînin, ew fena hopelekî ziq li wir veniştîye.."

Bû tîqtîqa gundiyan, eywan bû gola req û beqan, xudanê malê xwast tişteke bibêje, lê kesekî guh nedayê, ewî li dostê xwe nêriya, dît ku Hopel di cî



de rabû û devê xwe da deriyê odê, bi lez vekir û bi derve da...

Ew çû, winda bû, lê hejarî ne dizanî, ku çanda navlêkirinê li herêmên Kurdan yên din jî mîna herêma Kurdaxa hêgin û gihîştîye..Dibe, ku ew çû Erebestanê, ku li wir çandêke din heye, ne mîna ya Kurdan e..ewan mirovan bi navê bajar, êl, malbat û karmendiya wî nav dikin, ne bi kêmanî û tuneziyên wî..

Seriyê di avê de

Cankurd /2001

cankurd@hotmail.com

Berê pêşserên me li ber agirê kutikan, di şevên zivistanê de, ji hev û din re çêrok digotin û şevbuhêrkên xwe yên dirêj bi xweşî û şadî, bi biratî û hezkirin, bi hêviyên xweşik, bi stran û henek û tinazî diborandin. Kesekî ji guhdarên wan çêrokên leheng û mêrxasan nedigot, ku ev çêrok nakeve seriyên, an jî ev çêrok efsaneyêke tijî derew e, an jî ewê, ku dibihîst dida ber jimartin û pîvanê, ka çiqas rastî û nerastî tê de hene, lê tevan bi dilgermî û bi çavên beloq û guhên xwe yên bihîstok guhdariya çêroksund û efsanebêjan dikirin û tenê dipirsîn: "Gelo! Dê piştî vê bûyerê çi bibe? Dê dawî çawa be? Ma wê mêrxasê çêrokê bigihe daxwaz û armanca xwe û dota şahê xwe li xwe mar bike û li ser textê şahî rûne?.." Rastî an nerastî ne giring bû, çêrok giring bû..

Lê niha her tiştêkî, ku em ên çêrokbêj dibêjin li ser me tê jimartin û tê pîvan û rexnegirên me mîna lawiran di dora me re digerin, didanan qîç dikin û hene gaz û terazûn kirine bin çengên xwe û dixwazin bizanin; ka van çêrok rastin an ne.. Lew re ezê di seriyê çêroka xwe de bibêjim: " Eger tu, ey xwendevanê hêja, li rastiyê digerî, di serî de bizane, ku navê vê hunerê çêrok e ne ceografiya û ne dûrok e, ez bi xwe jî nizamim, ka çend diram rastî tê de hene û min bi xwe ev çêrok pêda ne kiriye, min bingeha wê bihîstiye û ez dixwazim ji te re jî bi zimanê xwe yî jar çêroka xwe li ser vehûnim û eger tu tenê li rastiyê digerî, divê tu hîç nexwênî û dev ji guhdariya efsane û çêrokan berdî, tu roman û novelan nekirî û nexwênî.." Lê dîsa jî guhê xwe bide birayê xwe, rast û nerast bihêle li aliyekî.. Di serdema şah û şahzadeyên hovane de, gellek mirov hebûn nedikarîn nanê zikên zarokên xwe bi dest xînin, tevî ku ji berbanga sibê ve ta bi êvarê di kar û xebat û kefteleftê diman..û ji ber ku zarokên wan goşt tenê du rojan di salê de, mebest rojên cejn û şehyanê, di Newroz û Mîhrecanê de, pişt re di cejna Rojiyê û ya Qurbanê de, bihna goşt û biryanê (kebabê) dihat bêvlên wan, bavên wan ji xwe re dihizirîn; ka çawa zarokên xwe têr bikin û bi çî rêkê bo wan goşt bi dest xwe ve bînin. Hinek hişmend ji ber wê pêdiviyê bûn nêçîrvan û li çol û çolistanan li pezkovî, kêguh, qaz û tivîrkan geriyan, ji wan re

dav vegirtin an jî bi tîr û kevanan ewan ku tin û ji ber wê yekê jî niha li niştê me yî, ku ewqas dar û daristan lê hene, lawir û balind û firind kêmbûne û hinde nijadên wan jî nemane û li welatê me jî lawiristan nînin, ku mirov zarokên xwe bibe wir û bo wan bibêje: "Ev gur e, ev hirç e û ev kovî ye".. Ez vê dibêjim, lê yekî mîna min li teniştê min rûniştîye, seriyê xwe di ser milên min re dirêj kiriye û di ber xwe de dibêje: "Gelo! Mirovistana me tune ye, dê çawa lawiristan hebe?!"..

Mîna wan nêçîrvanan hinde mirovên din jî bûn masîvan, diçûn di çemên avê de masî digirtin, carinan ji wan re gol ji keviran mîna sincên biçûk çêdikirin, hinek dan û nan an dewarekî mirî davêtin nav golê û di bin tariya şevê de li bendê diman, ku masî bîn hindir gola wan û gava teprepa masiyan di golê de dibihîstin, ji nişka ve mîna ên Gonê şilf û tazî dibezîyan, bi hembêzeke pîkin û çiloyên tehlî an gezê deriyê golê disiqandin û mîna hirçê rûniştî masî digirtin û davêtin derveyî avê, an jî bi xiştên wek misasan dirêj li wan masiyên bêguneh dihatin hev, ewan kerker dikirin û dikuştin..Roja din beniyên masiyan li ber deriyên malên xwe bi dar dixistin, hinek didan nas û merivên xwe û ên din jî didan zarok û jin û dotên xwe, dibirajtin an jî di zêtê de diqewirandin û dixwarin..

Rojekê sê masîvan çûn ber çemekî, ku li bin keleha şahê wan bû û goleka xwe ya ji kevir û şehfan ava

kirin, ku masiyan bihêwirînin nav golê û dîsa wan bigirin..Demekê xwe di kortekê de daqelaztin, bi dizîka bi hev re peyivîn, ku masî dengên wan nebihîsin û nerevin..Heylo! Mirov çî pîs e, çî zorbaz e, bi huner e, fêlbaz e..!!

Piştî demekê, ku hêveke çarderojî li ezmanê sayî li wan temaşa dikir, yekî ji wan, ku navê wî Harmend bû, bi dizîka seriyê xwe ji kortê hilda û got:

- "Divê em niha rabin! Gola me niha tijî masî ye.."

Yê dî, ku piçekî ji herduwên din qelewtir bû û navê wî Xurmend bû, got:

- " Min hîç teprepa avê nebihîst, diyare masiyan kuxîna me bihîstin û reviyana an jî bihna hirçekî ji dûr ve kirin, nema hatin.."

Yê sêyemîn, ku ji wan herduyên din pîrtir bû û navê wî Hoşmend bû, got:

- "Eger bihna hirçekî hatibe masiyan, ew hirç tuyî, kuro!! Ma te pirça ser govdeyê xwe nedîtî? Ma te hîç carekê li ber nînikê li xwe temaşa nekirî?"

Harmend lê vegerand: "Ma ew di çî nînikê hiltê?!"

Peyayê qelew li ser riswakirinê bêdeng ma, bersiv neda.

Her sê bi dizîka kenîyan û ji ciyên xwe rabûn û bi lez û bez rahijtin derbendên xwe yê ji çiloyên tehlî û gezê û ber bi avê ve beziyan. Ji hindirê golê ve şewqeke şîn ya mîna kehrebê bi ser aliyê din ê golê ve perwa bûbû, lê ji wan bû ew şewqa hêvê ye, li ser rûyê avê dibirîse..

- "Lo ev çî ye..?!" Di ber hilkişî sîng re, deng bi Xurmendê qelew ket. Çî bibînîn?! Hemî masiyên, ku ketibûn golê mirî bûn, binzikên wan ên sipî bi jor ve, li ber rohnîya hêvê dixuyan..û di orta golê de seriyê mirovekî, ku berê wî bi çîya de, bi aliyê din de, bi ser avê ketibû û ji çavên wî serî du tîrêjên şewqeke şîn bi aliyê çîya ve diçûn..Ewê pîr gote wan: "Hajê xwe bikin! Li serî nenêrin, bila çavên we li çavên wî nekevin..Min berê çêroka vî serî bihîstiye, lê min bawer ne dikir..vaye hûn dibînîn! çêrok rast û dirist e, masiyên me tev mirîne, tev hatin kuştin loranî wan li çavên seriyê bê oxir nêriya bûn.." û bi şûn ve çû, dêmê xwe guhart, tayên tehlî û gezê ji bin çengê xwe avêtin û ewên din jî mîna wî ji ber golê baz dan, bê ku li seriyê di avê de binêrin, dîsa vegeyriyan korta xwe û xwe tê de daqelaztin.

- "Werin, em ji vir birevin" Xurmend gote wan, yê dî jî, Harmend got:

- "Lo ev çî xişim hat seriyên me? Te dît çiqas masî mirine?! Em niha çî bikin?!"

Pîremêr Hoşmend got:

- "Birano! Em ku ve birevin? Çîma birevin? Min niha hûn ji mirinê qurtal kirin, eger çavên we li çavên serî ketana, hûnê yekser wek masiyan bimirana..Masî ne tiştin..Lê jîna me niha giringtir e..Divê em li çavên serî nenêrin û em sermiyanekî mîna vî serî ji dest xwe bernedin, ev hêzek e mezin e, em dikarin bi vî serî gellek armancan bi dest xwe

ve bînin, bibin maldar, xudan sera û eywan, xudan hêz û kêr, gellek zêr û zîv, jin û marî bi dest xwe xînin..Dê hemî kes ji me bitirsin, çi nêz û çi dûr, çi nas û çi ne nas, çi birçî û çi têt, çi serdest û çi bindest..Hûn têgihîştin ez çi dibêjim: Ev hêz e, ev zor e, ev deban û ev şûr e.. Ev rohaniye, ev rumê Rustemê zal e, ev Avêsta Zerdeşt e, ev keştiya Nûh e û hespê rewanê bi basik e.."

Xurmend got: " Bi a min be, emê ji vir biçin û pîrsa serî û masiyan ji bîr bikin, ji kesekî re li ser nepeyivin."

Pîremêr bersiv da:" Bêhişo! Ma kî ji gundê me nizane, em hatine masîvaniyê?!..Sibê eger hinek vî serî di gola me de bibînin, dê mîna masiyan bimirin, ewên ku ji wan sax bimînin, dê gumanê bibin ser me û dê bêjin, ku me seriyê kesekî birrî bû û avêtibû golê."

Harmend got: "Bi Xwedê rast e. Divê em çareyekê bibînin. Vî serî ji gola xwe derxînin, bila bi avê de here.."

Pîremêr bersiva wî jî wilo da: "Birayê min! Gava ev serî bi avê de here, dê gellek kes li çavên wî yên şeryar û bê oxir binêrin û yekser bimirin..Niha hûn jî dizanin, ku çavên kê li çavên vî serî dikevin ew dimir e, ma xelkê din dizane?, lawir û balind û sewalên bêguneh çi dizanin?! We bi xwe dît, çawa masî tev mirîne.."

Xurmend got: "-Em dikarin di binê avê re ber bi serî

re avjenînê bikin û wî bînin."

Pîremêr got:

"-Ezê te bikim mirovekî kûr, ku çavên wî nabînin."

Pîremêr ji wan re pilanek pêda kir, ku serî ji golê derbixînin û masiyên mirî jî bicivînin û li gel xwe bibin, da kesek hîç gumanekê nebe ser wan, çavên hreviewê xwe Xurmend bi paçekî reş girêdan, telîzek kir destê wî û ber bi golê ve hinart û jê re bi dengê xwe rê rast kir, ji wî re çeprast diyar kir, ta ew çavkûrkî giha golê, rahêjt serî, xiste telîzê xwe û bi şûn ve zîvirî, paçê ser çavên xwe avêt û bi lez û bez hat ba herdukên din. Pişt re hersê beziyan, masiyên xwe bê parvekirin xistin çiwalekî, hildan ser milê Harmend û pîremêr seriyê bi telîz hatiye têwerdan û peçandin, hilda milê xwe û ber bi gundê xwe ve baz dan.

.....

Harmend li pa maxa mala xwe ya nizim û tarî li ser herdu çogan xwe berda bû ser kulavekî, seriyê xwe xistibû nav herdu lepên xwe û xwe dihejand, jina wî jî di hafa seriyê wî re rawestiya bû û digotê:

" - Hey Xwedê tu nehêsto! Hey nemêro! Bêhişo!..Tu çawa çû seraya şahê zorbaz û te xinizî li herdu dost û hreviewên xwe kir? Ma dilê mêran di sîngê te de tune bû? Ma dayik û bavê te herdem kezeba kêrguhan dane te? Bêje min; te çima halo kir?!."

Harmend piştî soliqekê bersiv bi dengê mîna dengê nexwe an da jina xwe:

"- Lê bese..bese..bese..Bila min rêx li ser çavên xwe hêşta ji vê yekê çêtir bû..Min ji tirsar re wilo kir..Min ji tirsar kir..Heft zarokên me hene, eger rojekê pêrewên şah li me hişyar bana, ku me seriyekî wilo dîtîye û şah pê agahdar nekiriye, dê heft zarokên me sêwî bimana..Ma ez nizanim ev xinizî bû?! ."

Jina wî lê vegerand:

"- Te ewan herdu dan girtinê, ma wê careke dî ronahiyê bibînin? Ma zarokên wan jî tune ne?!.. Ezê çî ji zarokên wan re û ji ên xwe re bibêjim?! Te rûyê min reş kir, te navê xwe jî ji navêl û malbatan rakir û sîl kir..Niha ewan di kijan zindanê de ne, kesek nizane, çî bi seriyê wan tînin, kesek nabihîse..Lê bi Xwedê mîter û leşwêrankeran dê wan ji mêranyê bikin, dê wan wilo bidin bin zorê, ku ewan li roja zayîna dayikên xwe bigirîn û poşman bibin.."

.....

Li eywana padişahî hêlehêl û qîreqîr bû, li herdu aliyên eywanê pêrew û nas û serhêz û wezîr li hember hev û din li rêz rûniştibûn..Zinginî bi çangan ket û padişah bi xemla xwe ya şahani ji aliyê paş ve bi eywanê ket. Hemiyar dengên xwe birrîn, ji ciyên xwe rabûn û seriyên xwe ji şahê xwe re çemandin, şah çavên xwe li eywanê gerandin, li ser textê xwe danişt, çovê sewlecanî bi dest xwe de leqand û piştî bihneke dirêj ji bêdengiyê kêr, got:

"- Ma hûn dizanin bo çî min şandiyên xwe hinartibûn pey we tevan?!"



Bû humhum û gungum, her yekî li yê teniştî xwe nêriya, kirin pisepis, lê kesekî bersivek diyar neda padişah.

Padişah got:

"- Ezê niha li we mînim, ku şahê we xudan hêzeke mezin e, êdî kesek nema dikare zora me bibe, ne sihirbaz û ne jî şahên hêzdarên rojhilat û rojava.."  
Şalyarê wî, ku li ber textê wî piçekî li xarê rûniştibû, ji ciyê xwe rabû, li teviya mêvanên rûniştî nêriya, pişt re seriyê xwe ber bi padişahê xwe guhart û got:

"- Ji berê de kesek nikare zora me bibe, Meger tu şahê me yî kes nikare zora me bibe..Hêz û zora me heye û besê me ye." Teviya kirin hêlehêl û hinan jî got:

"Erê! Rast e.."

Padişah got:

"- Berê em bi hêz bûn, ev rast e, xebera te ye, lê ji îro pê ve em ji teviya cîhanê bi hêztir dibin..Ezê niha ji we re hêza me diyar bikim.." û bi çovê xwe li çangeke biçûk xist, ku li ber lingê wî bû, ji paş textê wî ve du kole zêtkirî, qanat û kurpiz hatin û di nav xwe de sîniyê mezin hilgirtine û li ser sîniyê jî sandiqeke reş û devgirtî heye, anîn li teniştî textê şah danîn û bi şûn ve çûn.

Şah got:

"- Niha ji min bang li sihirbazê tev jîr û jêhatî, zana û pîlanger, bikin, ewî li pê maxa eywanê çavrêya bangdêrê min dike, bang lê bikin bila bête vir..Lê ez

ji we gi an dixwazim, ku kesek ji ciyê xwe ranebe û bizava xwe neke, ku bibîne çi di hindirê vê sandiqê de heye.."

Şalyar deng li dergevan kir, dergevan bi lez çû pey sihirbaz û teviya rûniştiyan histodirêj, çavbeloq, bal û dêna xwe dane şah, çavên xwe ji sandiqê nebirriyan, ka wê çi bibe..Sihirbaz hat, di nav herdu rêzên rûniştiyan re gav kir, hat li hember şahê xwe ziq rawestiya, seriyê xwe çemand û got:

"- Ez di fermana te de me padişahê min!"

Şah keniya û got:

"- Ta niha tirsana min ji te hebû, lê ji îro pê ve ez nema ji sihra te ditirsim..Min dermanê wê dît û êdî ez ji te sihirbaztirim.."

Sihirbaz keniya û çepik lê dan, ji nişka ve li herdu aliyên wî du sihirbazên wek wî pêda bûn û hersê bi hev re kenyan..Şah li wan nêriya û got:

"- Meger tu wilo jîr û zanayî, fermû vê îskemê (sandiqê) veke û zêrê hindirê wê ji xwe re bibe, niha min bawer kir, ku tu hêjayê sandiqa minî.."

Sihirbaz da çepikê, pêjna (xeyala) wî ya aliyê rastê çû, devê sandiqê vekir û ji ni ka ve li ser piştê kete xarê, mirdar bû û yekser winda bû.. Şah devê îskemê, bê ku lê binêre bi çovê xwe girt. Careke din sihirbaz li çepikê da, pêjna wî ya çepê ber bi sandiqê ve çû, devê sandiqê vekir, ew jî di cî de bi şûn ve gêr bû, mir û winda bû.. Şah dîsa devê sandiqê bi çovê xwe girt, bê ku lê binêre. Ew keniya û zikê wî hilat û

dahat..Rûniştîyên li Eywanê lal û mat man, seriyên xwe hejandin û tirsîyan..Padişah got sihirbazê, ku tirsê dilê wî girîtiye:

"-Devo! Te dît ez çawa sihira te dikujim?!"

Sihirbaz xeyidî û bi lez ber bi sandiqê ve çû, serdevka wê rakir û ew jî bi paş ve gêr bû, kire fixfix, bihna wî hat birrîn, rûyê wî reş bû û li orta eywanê dirêj bû, ji heft canan canek tê de nema.. Şah bê ku li sandiqê binêre, bi çovê xwe serdevka wê da ser û got:

"-We niha bi çavên xwe dît..termê sihirbazê, ku me bi carekî nedikarî bigirin an bikujin li ber lingên we ye.. Mir..çû..geber bû..Kê wilo kir?! Serî..Erê seriyekî bê la , bê term, seriyekî hatiye birrîn, ku ta niha di avê de bû, di çemekî de bû..berê çêrok bû, lê niha rastiye..Ev rastî heye, rast e..Erê ev serî niha bûye dêrîna (mulkê) min..Ewê, ku li hember min rabe, li ber min raweste, dê wek sihirbazê we li ber lingên min bibe termekî bê jîn..We dît û we bihîst..De rabin belav bin..!"

Pêrewên şah tev ji ciyên xwe rabûn, bi dizîka bi hev re kirin pisepis, ber bi sandiqê nêriyan û ji eywanê yekoyeko derketin.. Şalyarê (wezîrê) şah xwast ti tekî bibêje, lê diyar bû ewî nezanî çî bibêje, ew jî hêdî-hêdî ji sendeliya xwe hilbû, carekê li şah û sandiqê, carekê jî li termê sihirbazê mirî nêriya, seriyê xwe hejand û ji eywanê derket û di ber xwe de got: "Heywax! Çî bi seriyê me hat?!" şah li koleyên

xwe nêriya û got:

"- Eger kesek xwe ji sandiqê ve nêz bike, ezê we bavêjim ber şêr û pilingan..sandiqê deynin razangeha min.."

Ji ciyê xwe rabû li pey wan û li pey seriyê di sandiqê de ber bi razangeha xwe ve çû.

.....

Di demeke kin de şahê zorbaz zorbaztir bû, hêza wî pirtir bû û bandora deselatiya wî firehtir bû.. Ewî hêriş û talan dajotin ser êl û mîrnişîn û şahnişînên li derdora ya şahdêrîna xwe, bi xwe re seriyê jînkuj li gel xwe dibir cengê, gava leşkerên neyarên wî bi hember wî diketin, seriyê xwe derdixist û rûyê wî ber bi wan dikir, ji çavên serî tîrêjên agirekî sor û şîn ber bi wan dipijiqîn û gava çavên neyaran û hesp û fîlên wan li wan tîrêjan diketin, ewan yekser dihatin kuştin..

Ne tenê li hember neyarên xwe, li hember gelê xwe jî şah serî bi dest xwe de kiribû debanê (sîlahê) wêrankirin û tunekirinê. Her kesê, ku li hember wî seriyê xwe hildida, dihat girtin û bi tîrêjên çavên seriyê bê yûm dihat ku tin..Êdî rew a gel têk çû û ken û xweşî ji dêm û devan winda bûn, çi mezin û çi biçûk ji tirsê serî bûbûn koleyên lal, serî çemandî, dil tijî xem û nava her kesekî ji wan ji tirsê serî hatibû bizdan.

Kesên hişmend û zanayan newêribûn devên xwe vekirana, nîvzana û nîvmêr li dora şah bi hezaran

civiya bûn û ji sibê ta bi êvarê pesna serî didan,  
helbestvan û hozanvanan hozanên xwe li ser şah û  
seriyê, ku di bin destê wî de, vedihûnandin, keç û  
jinan jî komik bi komik li dor sandiqa, ku serî têde  
veşartî bû, dîlan û sema digirtin, bi lîlîn û bi  
dengnazîn hing û stran û şadî çêdikirin, zêr û zîv û  
gerdenên xwe davêtin ser sandiqa serî û zarokên  
xwe bi navê şah û seriyê tirsavêj navdikirin. Lê dîsa  
jî hinek hebûn, çend zanayên bêtirs li çavên hev û  
din dinêriyan û dizanîn çî bi çavan ji hev re bibêjin,  
bê ku bêjeyek ji devên wan derkeve.. Hinekan  
perdeya tirsê çirandin, lê mixabin! Mîna pinpinîkan  
li ber agirê çavên serî hatin sotandin û tunekirin..Û  
şah, şah bûbû diholeke pir bi deng, fort û fûtên  
mezin ji devê wî derdiketin, gellek tiştên nerast û  
nehêjayê mêran disapirandin, û pêrewên wî yên  
bêvac êdî çêrokên nedîd li ser qehremanî, zanabûn û  
mêraniya şah digotin..

.....

Di tariya şevê de, li ber alafa me xeleke biçûk,  
şalyarê şah, ku rûyê xwe peçinandibû, di ser pileyin  
kevirî re hêdî-hêdî daket binê zindaneke tarî, lihêmî,  
û gellek kûr di binê zevînê de..Ji dergevanekî , ji  
herdu dergevanên, ku li pey wî bûn, pirs kir:

"- Kîjan ji van Hoşmendê pîr e?!"

Dergevan çû nav komeke mirovên rûniştî, ku rihên  
wan wek dûvên hespan dirêj bûne, goşt bi hestiyên  
wan ve nemaye, didanên wan ketine, rohnî di çavên

wan de vemiriye û bihneka genî ji kulên li teviya govdeyên wan belavbûne tê bêvilan, seriyê qamçeya xwe da ser milê yekî ji wan û gote şalyarê xemgîn û bêdeng mayî: "-Ev hoşmend e, seydayê min!."

Şalyar gotê: "-Ka bîne, bila em herin.."

Hoşmend bizava xwe kir, ku ji ciyê xwe rabe, lê bê alîkariya herdu dergevanan nikarî bû ji ber ku hêz û kanîna wî nema bû, ew gellek jar û westiya bû, wek sepeteka hestiyar bû.. Ew bi xwe re rakişandin, li pey xwe xuşandin, di wan pileyên biçûk û teng re ji jêzemînê derxistin, birin maxeke bêtir rohnî tê de heye. Şalyar gote dergevanên zindanê:

"- Herin ji vir ! Karê we nema.." û piştî dergevan ji maxê çûn, bêdengiyê perdeya xwe berda ser wan û taveke rohnîyê di taqekê re perên xwe avêtin ser wan herdukan, şalyar gote Hoşmend:

"- Bo min gotin navê te Hoşmend e.. Eger tu rast Hoşmend ba, te ev seriyê bêyûm nedihanî, te xwast, ku tu bi rêya serî bibî hêzdar û maldar, li şûn hêzdarî û maldariyê tu ket vê çalê û nema tu rohnîyê careke din dibînî, şahê me hreviewê te yê qelew Xurmend avêt ber lingên şêr û pilingan û yê din Harmend ji ber xinizîya xwe şêr û dîn bû, jin û zarokên wî ew ji mal der kirin, bi çol û çolistana ket, sernizim û rêwinda, tî û birçî û li dawiyê li bin darekê diz û kelean ew girtin û darve kirin.. Ma ev hoşmendî ye?!"

Bi dengekî jar û nizim Hoşmend pirsîya:

"- Tu niha çî ji min dixwazî?! Di tariya vê zindanê

de, piştî van gellek salan hîn jî poşmanî roj bi roj  
dilê min diçirîne, hinavên biz dide û hestiyên min  
dihêre.. Ma ji vê bêtir êş û wêranî heye?!"

Şalyar got: "- Erê..heye..Tu nizanî bi wî serî çî li  
derve ji zor û sîtemkariyê tê kirin!! Û êşa mezintir  
ewe, ku em kesek nikarin tişteki bikin, em bêhêz û  
bêçare mane..Ji bo vê ez hatime ba te, dibe tu  
çareyekê bibînî.."

"- Çima ez, ma ji min pê ve kes nemaye rê û çareyan  
li ber we veke.."

"- Hişmend û zanayên me newêrin devên xwe vekin,  
ewê ku li dijî vê xîmê derdikeve bi rêya seriyê, ku te  
dîtiye û aniyê, tê kuştin..Hişmend û zanayên me  
neman..Eger tu alîkariya min bikî, ezê te azad  
bikim."

Pîremêr piçekî bêdeng ma, dawî got:

"- Eger tu dixwazî min ji vê tariyê azad bikî, tuyê  
min bikujî, bila canê min ji van êş û kelemên di  
hindirê dilê min de vemirin..Azadiya min ewe, ku ez  
ji vê tariya hindirê xwe azad bibim. Çendî ez bijîm,  
ewqas ez di xwe de dinalim û disojim."

Şalyar destê xwe xiste berîka xwe û nameyek  
derxist, xwast ku bide dest pîremêr, lê pîremêr nedît,  
tenê xişxişa kaxedê di destê şalyar de bihîst, pirs kir:

"- Ew çiyê?"

"- Ev nameyeke ji zarokên te de."

"- Tu dikarî ji min re bixwênî?"

"- Ma tu bi xwe nikarî bixwênî?."

"- Ez kûr bûme, seydayê min, ez kûr bûme.."

"- Bibore min nizanî, ku tu kûr bûyî..Başe ezê ji te re bixwênim, lê tuyê alîkariya min bikî.."

"- Ezê alîkariya te bikim..lê divê kesek nizanibe, ku ez kûrim, nabînim..lê niha ji min re nameya zarokên min bixwêne, min çiqas bîra wan kiriye."

Şalyar name da ber rohnîya, ku di taqa jorîn re dihat xarê û xwand:

"- Bavê me!..Bavo!" Pîremêr destên xwe dan ser çavên xwe û guhê xwe da ser dengê alyar, wî jî hêdîhêdî jê re name xwand...

.....

Li eywana şahê zorbaz gellek pêrew û merivên xanedan û serhêz û serleşkeran rûni tibûn, şalyar ji ciyê xwe rabû û gote padişahê xwe yî, ku pir ji berê qurretir û sermezintir rûniştibû:

"- Şahê min î hêja! Ez dixwazim mizgîniyekê bidim te li ber van hemî pêrewên te yên dilsoz, ku min îro bangewaziya wan tevan kiriye; li vir amade bibin, bo vê nûçeya, ku gihaye min bibihîsin û ez ji ber dilsozî û wefadriya xwe bo padişahê xwe diyar dikim."

Padişahê qurre berken bû û got:

"- Tu dizanî, ewê min bixapîne an derewan li min bike dê çi bi seriyê wî bê!!."

"- Erê, ez dizanim, ewê bibe qurbana seriyê, ku ti tek nikare lê binêre û her rohnîyek li ber nêrîna wî vedimire, her canek dimire..Eger tu destûrê bidî min, ezê ji şahê xwe yî hêzdar û jêhatî re nûçeya xwe



bibêjim."

Çavên padişah livlivîn, lêvên wî lerizîn û got:

"- Bifermû, şalyaro! Te dilê min bi ser vê nûçeyê de germ kir ."

" Şahê min! Wek hûn dizanin, min çavik û guhikên xwe li her ciyekî belav kirine, bo min tazetirîn nûçeyan tînin û bi taybetî çi di nav neyar û dijminên we de tê rêstin û tê jenandin."

"- Erê, ez fêlbaziya te dizanim!."

"- Lê ta niha we hîn teviya jîrbûna min nedîtiye..Ezê îro ji we re diyar bikim, ku ez çi dikarim bikim."

Devê padişah, ku mîna devê qelazekî hi kbûyî, piçekî xwar bû, çovê wî di destê wî de lerizî û kabên wî jî hejiyan û teviya dîdar û tema evanan çavbeloq û guhpîç û bêdeng li şalyarê fêlbaz nêriyan. Şalyar got:

"- Min ji hindir zinadnê bihîst, ku pîremêrek di tariya binemaxeke biçûk de heye, ewî gotiye, ku sihira seriyê mirovkuj îro bi êvarê re, dema ro diçe ava, namîne û telasimê serî winda dibe û êdî bihna genî jê tê û her kesek dikare lê binêre, kesek nema bi dîtina wî serî dimire."

Eywana şah ji ni ka ve bû gola req û beqan, hemî rûniştiyan gotinên xwe li gel hev û din, bê westan û bê destûra padişahî kirin..Padişah bi dengekî bilind li çepikan da, hemî dîsa lal bûn û di ciyên xwe de rûniştin. Padişah got:

"- Ma ne ro çûye ava? Emê bibînin, ka serî mirovan

dikuje an ne..!!"

Şalyar bersiv da:

"- Ro hîn gazeke di ser asoyê çiyar re bilind e..Bo bi cih anîna vê yekê min ew pîremêr girtiye û aniye li ber dergahê eywanê rawestandiye..Eger hûn bixwazin, bi fermana padişahê min, bila ew bi roava re bi xwe li hindirê sandiqê binêre, ka serî wî dikuje an ne.."

Padişah kenîya û got:

"- Ev ramanê hêja ye..Ka wî bêhişê bînin.."

Bi lez û bez pîremêr anîn li orta eywanê, li ciyê girtî û destegîran derdixînin pêş padişah, rawestandin. Destê wî girêdayî, serînim, rihên wî dirêj gihane ser kaban, bi şeweyekî, ku kesekî tew nizanî bû ew kî ye.

Padişah gotê:

"- Rast te tişteke wilo gotibû, girtiyê bêhiş ?!"

"- Erê, şahê xûnmij û zorbaz, min ev gotiye û ez li ser gotina xwe me.."

Dîsa bû gumgum û hêlehêl, lê padişah zanî bû, ku ew li hember mêrekî bêtirs e, got:

"- Niha piçekî din ro dihere avan, ezê bibînim, ka te rastî gotiye an ne rastî. Ez dibînim, tu mêrekî bêtirsî, te çi kiriye, ku tu wilo ji zû ve di zindanê de mayî, bihna genî bi ser te ketiye?!"

"- Ez xudanê serî me..Ew serî yê min bû, ew hêz û kanîn ya min bû, te ji dest min girt û te ez kirim vê rewşê.."

Padişah bi xeyd bersiv da:

"-Bese, bese, Ro çû ava an ne, bêjin..!"

Şalyar gotê:

"- Erê, ahê min! Ro niha di pa çiyayî de winda bû û bi xwe re jîna derewkarekî rakir.."

Padişah bi hêrs serdevka sandiqê bi pozê çoyê xwe rakir, ji ni ka ve Hoşmendê kûr guhên xwe bel kirin û zanî bû sandiq li kî derê ye, û padişah bi qîrîn gotê:

"- Were bi xwe li hindirê vê sandiqê binêre, li seriyê, ku tu dibêjî ew dêrînê te bû binêre, ka te dikuje an na!"

Şalyar got:

"Şahê min! Eger tu destûra min bidî, ezê gavên wî bijmêrim, ka ew çendîn ji mirina xwe ve dûr maye.."  
Hemî kenyan û padişah jî bi wan re kire tîqtîq, zikê wî hilat û dahat. Şalyar dest pê kir, gavên pîremêr bijmêre, pîremêr jî gav kir, bê ku kesek bizane, ew kûr e, pêş xwe nabîne, wî jî hîç kûrbûn li xwe bêlî ne kir. "-Deh, neh, heşt, heft.."

Padişah keniya û got:

"-Heft gavên te bo jîn ji dest danê, bo mirdarbûnê mane, ma tu xatirê xwe ji me û mêvanan naxwazî?!.. e , pênc, çar.."  
Bi şalyarê jêhatî re gavên Hoşmendê pîr jimartin.

Li dawî ew giha ber sandiqê, seriyê xwe bi ser de xwar kir, daxist hindirê sandiqê, carekê seriyê xwe rakir û dîsa xist hindirê wê, bihneke naxwe ji serî hate bêvilên wî, çenga wî giha porê serî, lê wî serî

nedît, çavên wî yên kûr bûne li çavên serî neketin. Gava padişah wilo dît, êdî ji xeyd û tûrebûna xwe nema dizanî çî bike, destê xwe avêt gurmikê piyê pîremêr û ew bi ûn ve avêt û bi xwe beziya li hindirê sandiqê nêriya, bi çavên xwe, cara yekem bû, ku serî dibîne..û cara pa î n bû, ku seriyekî bi çavên xwe dibîne, ji hindirê sandiqê ve du tîrêjên ji rohnîya kesek derbas bûn hindir çavên wî, ew li ser pi tê gêr bû, kir fixfix û puxpux, ket û mirdar bû, yekser bê liv û bê şiv. Teviya mêvanan ji cî hilgavtin, lê şalyarê zana mîna birûskê beziya, serdevka sandiqê, bê ku li hindirê wê binêre, da ser devê wê, sandiq rakir û got:

"- Ev dawî bû..Di ciyên xwe de rûnin..Min bi pîremêrê hêja re peyman daniye, ku gava em zorbaz ji ortê rakin, emê serî tev sandiqa wî bavêjin nav agirekî tund, ku careke din kesek jê netirse.. Min gellek car gav bi gav eywan pîva bû û bi Hoşmendê hêja re wilo dirêj pilan kiribû, ewê çawa bibore, çend gavan bavêje, bê ku kesek li kûrbûna wî hi yar bibe..Niha jî we bi çavên xwe dît, çî bi seriyê zorbazekî hat..Min vê hêza wêranker û ahrîmanî naxwazim, min naxwazim, ku gel û nijadên din ji me bitirsin, min naxwazim em her û her di ceng û genga iyê de bin dij bi mirovên din, dij bi hev û din, min naxwazim bi darê zorê gel li pey xwe rakişînim..Divê em niha jiyanê nû ava bikin, bi biratî, bi aşîtî, bi mirovatî..Divê her kesek mafên

xwe û histobariyên xwe binase û em tev bi hev û din re mîna netewek ji pola, hevgirt û yekdest, di cîhanê de bête naskirin..Bi zor û sîtem û tirsê, bi lêdan û kurtin û bêparkirina gel, bi ezezî û çovhejandina ser seriyê gel re em nabin mirovên hêja..û ji vê pirtir nema ez tiştêkî din dibêjim."

Ji orta eywanê dengêkî bilind hat, xortekî tijî jîn û kefteleft, got:

"-Bijî biratî, bijî aşîtî, bijî mirovatî.."

Yekî din bang kir:

"- Fermû em di nav xwe de padişahêkî hîlbijêrin, ku ji bo van armanc û daxwazan bixebite, welatê me biparize, me bigihîne hev û din, çewtiyên me rast bike û di pêş me de alaya azadiyê, pêşketinê û mirovatiyê hilde jor.." Hemî bi vê yekê xweşnûd bûn, hêstir ji çavên şalyarê zana barîn, destê xwe di qirka Hoşmendê pîr û kûr re bir û gotê:

"- Were em berî her tiştêkî biçin seriyê mirovkuj û termê şahê zorbaz bavêjin nav agirî, weku me berê Zehak sotandiye bisotînin û xuliya wan bavêjin derveyî keleha xwe û divê tu bitî şuştin, divê te derman bikin û zarokên te ji te re bînin, tu bihna xwe bi wan derînin û dest bi jîneke nû bikî. "

Hoşmendê pîr bi dilekî xemgîn got:

"- Ezê pir dilşad bama, ku we seriyê min jî li gel termê şah û li gel seriyê mirovkuj bavêta nav agirê..Ezî poşman im, poşmanim..poşman.."

Şalyar gotê:

"- Gava tu destê xwe di destê min kî û em jîneke nû bo gelê xwe ava bikin, emê kul û janên xwe ji bîr bikin û bi hev re serbilind bin, emê bibêjin: Vaye me rêya xwe rast kir, me welatê xwe rizgar kir û me rûmeta xwe parist û paqij kir.."

Alole

Perwîz Cîhanî

Tavê pencê xwe yên narincî li pencerê ra dahîştibû nav holka min ya awaretîyê. Min serê xwe yê sergerdanîyê da ser her dû destên xwe yên kurt û pêşkêşî pîyên wê yên zêrîn kir. "Serê ku li rêka xoşewîstan da nebe, bila xwelî lê be."

Pencên tavê wek pêçkên dayîkek dilovan û yarek dilhebîn gijka\* serê min ko wekî gilingoya\* payîzê lev aliyabû, û ew mehek xişt\* bû rengê şeyi nedîtibû, bi dilovanî lawand. Min weke zarokek naznazok xwe li ber da qelizand û xwe li ber tirîşkên wê yên canhebîn û dilperwer pelîşand û laşê xwe yê nîvegîyan siparte germaya wê ya mirîvejîn û weke termekî li ber da veleziyam û ketim deriyaya hizrên aloz û ponijînên giran.

Ez li naverasta bestek hişk û hola, li nîveka çolek qaqir\* û bêavanek\* bêbav û bêav da wekî pezek gêj û havîbûyî\* lev dizivîm. Hindî çavan qeter dikir, deriyayek sore xîzê bû. Li naverasta wê deriyayê da hindî min çavên xwe digerland çi rê û dirbê, çi şûn û şopê dîyar nedikir. Ne nîşaneyek ji avê û avedanîyê li ber çavan diket û ne jî berjengek ji mirov û

mirovanîyê dihate xûyanê. Hindî çavan qeter dikir,  
her çol û bêavanek bêkuj û rex û asimanekî şîn û  
bêbinî bû. Her şeş alîyên min bibûn du deriyayan.  
Du deriyayên bê ser û bin û bê rê û bê nîşan.  
Guroverkek sore xîzê û sûtêk\* şîne asimanî, li  
nîveka her dû yan da jî xaleke reşe sergerdan, wek  
mêhrûyekê li tasek şimitoke dexûnedar da.  
Demaneke dûr û dirêj bû, ko ez li nîveka wan her dû  
deriyayên bêbinî da li qurtek av digeriyam. Lê qurta  
avê bibû dilopekê û li deriyaya xîzê da noqimîbû. Ez  
jî weke wê dilopê li nîveka her dû deriyayan da cûm  
bibûm.  
Hergava ko min hingek\* dida xwe û pêngavek  
radikir, ez ta kaban li xîzê da çik dibûm. Min ta  
pîyekî xwe ji xîzê derdixist, pî yê min yê dî ta çokan  
li xîzê da xîş dibû. Ez geh pêşda diçûm û geh jî min  
li dû xwe ra li şûna pîyên xwe dinihêrî. Digel wê  
hindê ko ez ta çokan li xîzê da xîş dibûm jî, lê li dû  
min ra çi şûn, şop, rêç, û dewes nediman. Te digot qay  
ev cîhana dijî hemû şûn û şop û rê û dirb û şûnewar  
û berhemane. Dijî jîn û vejîneye. Ez digeriyam. Lê  
geriyana min levgeriyên bû. Hindî ez digeriyam û  
nedigeriyam, carek dî ez dihatim û li şûna xwe ya  
pêşîn da radiwestam. Heman li wê nuqta pêşîn.  
Belke jî ew nuqta neba, lê min wisan hizir dikir.  
Lew ra ko her der wekî hev, bêxal û bênişan bû.  
Lê ez ne mirovekî palûmsist û westek bûm. Min li  
ber xwe dida û ez lev digeriyam. Durust wek

kehlanekî tewldayî, ko ji bo rizgarîyê têdikoşe û lev digere. Lê li her gerekê da tewla\* wî li dora sikeya\* wî diale û bere bere meydana tewla wî teng û tengtir dibe.

Ez hind li wê besta bêav û bêbav da levgerîyabûm, ko zimanê min li şikevta devê min da weke kevirê pêşokê\* hişk û qulqulkî bibû. Min hind çavên xwe li asoya bêbinî, li nîveka erd û esmanan da li dilopa avê gerandibû, çavên min reşkopeşko\* lêdidan. Hindik mabû, ko ez ji têkoşînê bêhîvî bibim û dest ji ber xwe bikêşim. Lê durust li wê demê da bû, ko dûrva durust ew cîhê ko erd û esman bi hev va hatibûn dirûnê, tişteki bînanî dûkelek belaş\*, weke dûkela cigara cigarekêşekî neşî\* lev digerîya. Bi dîtina wê dûkelê ra ez wisan şa bûm, ko min hemû derd û kulên xwe ji bîr kirin û hîvîdarîyê cîhê dilsarîyê girt. Te digot qay giştî vê cîhana pan û berîn bi destekî dilovan pêşkêşî min kirine. Ez bi gef û gur ber bi dûkelê bezîm. Dûkel nîşaneyek ji avedanîyêye. Min per û bask deranîbûn û ez bi gulşayî ber bi dûkelê dibezîm. Lê hindî ez diçûm û nedîçûm, ez bi dûkelê ra nedigihîştim. Hindî ez diçûm, hind diçû dûkel ji min dûr diket. Li wê besta bêbav da dûkel bibû karxezalek sil û revok û li ber min dibezî. Bere bere dûkel bû leylanekê. Lê gîyan şîrîn û jîyan xweş û mirin tale. Kê amadeye hema wisan xwe bide destê mirinê û ji bo man û jînê tênekoşe. Min dest ji leylanê jî nekişand. Lê leylanê



jî per deranîbû û ji min direvî. Ez li cî da rawestam û min li dû xwe ra li dewsa xwe nihêrî. Çi tişt nehatibû guherînê. Ez ta çokan li xîza sore hûr da çik bibûm û heman li cîhê xwe yê pêşîn da rawestabûm.

Ez ji xwe û ji hebûna xwe şermezar bûm. Serê min bêhemdê min kete ber min. Durust di wê demê da bû, ko min seh kir, dîmen\* hatîye guhestinê. Gava ko min serê xwe rakir, min xwe li nava çardîwarekî kewn û kelefê\* kelayek mêjîn da dît. Çardîwarekî bê der û bê pencere. Dîwarên kelefê hind bilind bûn, ko çûbûn ber perê asimanan. Li ser dîwarên kelayê ra asiman hindî kefa destê zarek sava dihate xûyanê. Dîwarên kelayê pê kevirên reşe arsoî hatibûn hilcinînê. Kefa kelefê li ber dirik û qelem\* û istirînên cur be cur nedihate xûyanê. Cengelek sosret ji qelemên çêşît çêşîtî. Bi hezaran dirkeşîn, istirîzerik, hêştireqelem, kerqelem, caşqelem\*, dirîreşk, kerteşî, kerbeşk\* û caşebeşk lev alîyabûn. Mirov nikarî pîyên xwe li ber kerengzer û kerbeşk û caşebeşk û kerteşîkan bavêje. Li pêşîra dîwaran da jî li nîveka qelş û celxan da devdîş\* û dirkeşînan qolqolî serê xwe weke şûjin û derzîyan deranîbûn û dapîroşkan bi hevo û firêtên tewnên xwe dirkên pêşîra dîwaran û kefa kelefê bi hev va hûnabûn. Ez weke termekî bêcan li nîveka deriyaya dirikan da bê hej û liv mabûm.

Min dil kir, ko pîyên xwe bavêjim û li dû rêyekê, çareyekê bigerim.. Lê bi xişpêna pîyên min ra hej bi

tewna dapîroşkan ket û seranserî çardîwarê ko ez  
têda dagîr bibûm, weke deriyayek pîrpêl hejikî û di  
çavqirpandinekê da çawa li ajîra xeterê bidin, bi  
hezaran dapîroşkên reşe xûnmij xwe bi hevoyên  
tewnên xwe va daliqandin û lêmiştta wan weke  
leşkerê dabetulerdan\* hêrişî ser min kirin.  
Hizra revê li min dest da. Erê revek heye ji  
mêranîyêye. Lê kuda û çawan. Her çar alîyên min  
çardîwarên kevirîn ber bi asimanan hilkişiyabûn.  
Lê can şîrîne. Min dest bi revê kir. Lê bi her pêgavek  
min ra bi hezaran kerbeşk û çabeşk li potikên min  
alîyan. Her pirtikek ji potikên min bi destê  
çabeşkekê va ma. Dirikan bînanî seyên har û bîrsî,  
wekî seyên polîsên nehênî û çendqolî qîl li çîp û pê û  
pelek û eşk û teşkên min ra dikirin. Ez li nava gola  
xûna xwe da mewicîm. Herçend ko jîyana li nava  
dirik û kerbeşkan da jîyan nayê jimarê, lê dîsan jî  
can şîrîne û berxwedan pê divê. Min digel rev û bezê  
bi dest û dev û diranan ew dirikên ko li pê, pelek û  
textikên çok û nêk û gurmikên min ra diçûn, derdanî.  
Lê şûna wan her diman. Ta ko ez li vê cîhanê zindî  
bim jî, dewsa wan dê her li ser can û cesetê min  
bimîne û çî caran kew nagire. Piştî mirina min jî ew  
dirikana yê wekî dirka Bekiroki li rex gora min hêşîn  
bibin û nehêlin tirîşka tavê bide ser kêl û berên min  
jî.  
Ez li nava deriyaya dirikan da li ber dapîroşkên reşe  
jehrîn heldihatim. Lê bi her livek min ra bi sedan û

hezaran dirik û kerteşîk li leşê min dialîyan û çîk û  
birûsk û kênc\* û êşa wan xwe didane binê dilê min.  
Dirikan potik bi min va nehêlan. Ez rût û tût li nava  
dirik û kerbeşk û dapîroşkan da mabûm. Li wê  
hingame û şerê li nîveka man û nemanê da li  
naverasta wî kelefê bê der û dîwar da ez tûşî şermê  
bibûm. Min destê xwe dabû ber xwe, dako nebî nebî  
dapîroşkên xûnmij rûtaya leşê min bibînin û bi min  
bikenin û min bikin tiraneyê xwe. Koma dapîroşkan  
weke qertelên ko bêhna xûnê kiribin, ez li nava hev  
da girtim. Hindî hêza min hebû, ez qîjîyam. Dengê  
min li ser dîwarê pêşberî min ispêne\* kir û li ber  
ispêneya dengê min dîwar tîş bû. Bi tîşbûna dîwari  
ra ez li dilê xwe da şa bûm û min got rêka revê vebû.  
Lê digel vê hizra min ra, çavên min li ber qelşa  
dîwarê gorînê ra li telaşekî\* dirêj ket. Pîrhepokek\*  
mirovxor li ber qelşa dîwari rawestabû. Yeke rût û  
tût û qor û qoq û zer û zerhimî bû. Bejna wê wisan  
bilind bû, ko serê wê li nav ewran ra derketibû û  
giheştibû ber perê asimani û porên wê yên gewre  
gijik têkelî ewran bibûn. Serê wê pir mezin û uskura  
wê zirav û li ser rehekî bû. Asinekî jengorî bi  
zincîrek reş va girêdayî li uskura wê da bû.  
Nivîsarek weke dest û pencên dapîroşk û pîyên  
kewjalan\* li ser wî asinê jengorî hatibû nitilandinê.\*  
Pîrhepokê hingilê xwe yê rastê avîtibû ser milê xwe  
yê çepê û hingilê çepê jî avîtibû ser milê rastê. Li  
şûna şîr dilop dilop xûn ji serê çiçkên wê dinuqutî.

Gava ko çavên wê bi min ket, bû tîqetîqa wê û kenîya. Qehqeheya kena wê weke istewrehewrekî\* payîzî li nava kefe da deng veda. Dengê kena wê ya hişk û berzeq\* û giyanveroj û bêgîyan weke kartîxek\* tûj û jengorî li mejîyê hestikên leşê min da daçikîn. Pîrhepokê destên xwe dirêj kirin û xwest ko min bi wan her dû çengalên xwe yên hişk û dirêj ko xûn jê dinuqutîn, bigire. Lê ez weke zivirokekê li nav dest û pîyên wê da lev gerîyam. Pîrhepok bi liberxwedana min dikenîya û bi tirane serê xwe li hej û liva min ya bêwate dihejand. Her cara ko dikenîya û serê xwe dihejand, dewsa serê wê lekeyek reş û çilkin\* li ser panatîya asimanê şîne bêbin dihêla û asiman dilewitand. Li vê têkoşîna rizgarîya canî da bû, ko nişkê da serê pîrhepokê ji leşê wê diqetîya û li ser sîngê wê li nîveka her dû hingilên wê da cî digirt. Bi dîtina wê dîmenê ra li ber tirs û heybetan devê min vekirî ma û ez li cî da çik rawestam û min li laşê pîrhepokê yê bê serî nihêrî. Lê hê jî cotek çavên wê yên şîne rengmirî, weke cotek çavhêşînkên\* mat li korka çavên wê da li dû min direqisîn. Li dû ra pîrhepok bere bere hate guhorînê. Giştî hestikên leşê wê, hestikên ran û parxan û kovika qorkê hemû berev bûn û li valaya zikê wê da cî girtin. Di gavekê da giştî endamên leşê wê têkelî hev bûn. Lê bere bere dîsan endaman hev girtin û pîrhepokê cinsîyeta xwe guhorî û bû dêwekî bigevde û terikî. Dêwekî wisan bilind û terikî, ko serê wî li ser dîwarê kelayê

diket û pêşîya wê pirtîka ronahîyê ko li ser serê  
dîwarê kelayê ra dida hundur digirt. Dêwê yekçav jî  
wekî pîrhepokê rût û tût bû. Heya wî bêheyayî sunet  
nekirî bû û durust li ser navka wî pêva daliqiyabû.  
Her dû hêlkên wî hind mezin bûn, ko giştî hûr û  
pizûr û navgel û gurçik û hinavên wî berevî nav her  
dû hêlkên wî bibûn û her dû hêlik wekî du kîsikan bi  
du rehên zirav bi dilê wî va darda bibûn. Hêlikan  
giranî bi dilê wî dikirin. Tekçavekî gewreşîn ko li  
nava rehên sore xûnê da pêl vedidan li nîveka her dû  
birûyên wî da direqisî. Axabanîyek kurdî li uskura  
xwe alandibû. Her dû destên wî ta anîşkann li xûnê  
da werdayî bûn. Xûn çipik çipik ji pencên wî  
diniqutîn. Li destekî wî da xaçekî pan û çargoşe û li  
destê dî da perçemek reş, durust li ber wê qelşa ko  
pîrhepok lê rawestabû, rawesta. Dêwê yekçav li ser  
min da hurmicî. Bi dengê wî ra erd û esman tev  
hejikîn û li nav wê hêvirzê da gazî û hawarîya  
hevkarekî min li ber guçkên min ket. Dengekî  
nasiyar ko ji dûrva wek çawa li binê bîrek bêbinî  
derkeve. Min li dilê xwe da got: "Ay! Kuro ne eve  
hatibû kuştinê!"

Hevkarê min bi ah û zarî gazî dikir:

"Na, nabe. Min gift\* daye gelê xwe."

Lê dengê wî li nav dengê dêwê yekçav da bezir bû.

Dêwi bi dengekî bilind diqîrandê.

"Dermanê serbizêvan\* tenê merge." Bi dengê dêwi  
ra erdê li jêr pîyên min qelişî û hevkarê min bi laşê

xwe yê xûnavî va li ber pîyê min rawesta û hêdîka  
got:

"Tu hê mayî?"

Bêy wê hindê ko devê min ji hev vebe, min gotê:

"Mana min li rengê nemanê daye. Jîna min kirin  
jan."

Gunehê hevkarê min yê mirî bi min hat û bi dilekî  
şewat xwarî erdê bû û li nava cengela dirikan da  
qelemek dirîreşkê, ko rengê qelema bertiraşan dida,  
çinî û da destê min û got:

"Li çavan ra ke!"

Min got:

"Destê min nagîjê!"

Bi axiftina me ra dêwi pêngavek ber bi me avît. Bi  
pêngava wî ra min dît ko her dû pîyên min li ser  
uskura hevkarê mine û hevkarî xwe ji min ra kirîye  
nerdewan û ew qelema ko ewî dabû min, min dirêjî  
çavê dêwi fikir. Min nizanî qelem çawa gihîşte  
çavên dêwi. Gelo hêza min bû, yan hevkarê min  
gîyanê xwe xiste qalibê qelemê û qelema dirîreşkê  
per deranî û li bîbka çavê dêwi da rûnişt. Norîn bi  
dêwi ket û serê xwe li dîwarên kelayê da. Her çi  
dîwar hebûn hemû tev hirşîyan. Leşê hevkarê min yê  
bêgîyan li jêr dest û pîyên dêwi da helçiqî.

Axabanîya dêwi li uskura wî ket û min kelên ji dest  
xwe derneda û ew axabanîya li leşê xwe yê rût  
aland. Hê jî li wê dema sosret da şerm ji bîra min  
neçûbû. Min xwe ji xwe ra digot:

Şerme, şerme, bila kes rûtaya te nebîne!

Dêw li nava deriyaya qeleman da dinoriya û lev digerîya.

Gava ko min axabanîya uskura wî li xwe aland, çawa tava havînî li gulokek berf bide, laşê dêwi jî wisan bere bere bihoşt û biçûk û biçûktir bû. Dêw hêdî hêdî pûç dibû û ez jî berewajî wî hêdî hêdî mezin û mezintir dibûm. Gava ko dêw lap pûç bû û ji holê rabû. Vêca ez bûm dêwekî wekî wî. Dêwekî wisan mezin ko li holka xwe da cî nedibûm. Çawa cûncika li nava hêkê da zorê dide xwe û qalkên hêkê diqelişîne, min jî wisan zor da xwe û dîwarên holka xwe qelaşt. Çardîwarê holkê wekî qalkê hêkê her yek alîyekî da tep dibûn, ko çavên min bi sipîtaya qalkê hêkê ra jev vedibûn.

Tavehîvek zere zerhimî dabû nava holka min û hewa pir sar û cîhan kir û bêdeng bû.

03.03.2000 Zürich demhejmêr 00.57

Ferhengok:

alole: labiriyênt, (labyrinth)

kolana pir pêç û lev aliyayî, ko rêka derketina ji wê pir dijware.

gijik: porê aloz

gilingo: hirîya ko ka û kulî û gild û gemar lê aliyabe û aloz û gemarîn bûbe.

xişt: rebeq, tam,

qaqir: hişk û bêav

bêavan: çol, besta bêav û hişk  
havîbûyî: peza ko ji kerîyi biqete  
û aware û bê mebest lev bigere.  
Nexweşîyek pezane.  
sût: daîre, guroverk  
hing: (bi hêya qelew) hêz, zor,  
heja ji bo rabûnê,  
tewl: ew bend yan werîs û zincîra  
ko pê ajelekê girêdidin. Peyva  
tewle û tewlexane berewajî hizra  
hindekan erebî nîne, belko ji vê  
peyva kurdî hatîye girtinê.  
sike: sîng yan pîncê asinîn  
kevîrê pêşokê: kevîrekî reşî  
qulqukîye, ko taybetî şûştina panî  
û binê pîyane.  
reşkopeşko: reş û tarî, rewşeke ko  
li ber serêşîyê yan westiyanê çqv  
neşê baş bibîne.  
neşî: nezan, tazekar, ecemî  
belaş.belabûyî, jevberdayî  
dîmen: bînber, berçaven, menzere  
kelefe: kavi, xirbe  
qelem: kelem, dirik û her tişta ko  
wekî dirikan serê wê tûj û dirêj  
be. peyva qelem ko hindekan bi  
çewtî navê wê kirine pênûs yan  
pênivîs peyveke resene kurdîye û ji



zimanê kurdî ra ketîye nav zimanê erebî. Lew ra ko pêşda gava ko mirovan taze dest bi nivîsîna li ser kelpûçan kirin bi darikên sertûj yan jî bi dirikan, ko navê wê yê dî di kurdî da 'kelem, yan qeleme dinivîsîn. Paşê bo nivîsîna li ser beran qelemên asinîn hatin çêkirinê. Ta roja îro jî ew asinê ko bertiraş bikar dibin, jê ra qelem dibêjin.

Caşqelem: li Kurdistana rojhelat da gel ji wan kesên ko bi navê nivîskar dijî gelê xwe û keyanê gelê xwe dinivîsin û xwe û qelema xwe difiroşin, caşqelem dibêjin.

kerbeş: curek kerenge ko li kelefe û li nav zibil da hêşîn dibe. Melayê Cizîrî dibêje: qedrê gulan çi zanit, kerbeş divêt kerê reş( kerê beş) devdîş: dirikeke ko li cîhê germ û şoreket da şîn dibe.

dabetulerd: gorekî efsaneyan tebayeke li rengê mirovan da, ko ji devî ta pîyan hûre û her çi li ber dikeve dixwe.

kênc :( bi kêya qelew) êş, teşeneya êşê

ispêne kirin: inikas kirin, lê zivirîn

telaş: ew kelefê rîsê ko badane û amadeyî reng kirinêye. Kinayete ji mirovên zor bilind û lawaz

pîrhepok: pîra mirovxor

kewjal: kêvjale, kêmjaj, kewjal (xerçeng, seretan)  
nitilandin: neqîşandin. kolînkari. kolan û neqîşandin  
û nivîsîna li ser dar, ber û asinan  
istewreewr: ewrê istewr, ewrên ko dihurmin lê baran  
jê nayê  
berzeq: hişk û canveroj  
kartîx: qewre, amraza tûjkirina kêrik û tiştên weke  
wê  
çavhêşînk: kespîkek hêşîne ko dikin uskura ajelan  
yan gerdena zarokan da û gorekî bîr û hizrên gelîrî  
berga çavan digre û dijî çavên çavnebarane û çavên  
çavnebaran şîn û kor dike.  
gift: qewl, soz  
serbizêv: serhejin, kesê/a ko serê xwe dibizivîne. Ev  
têgîna ji layê dagîrkeran va ji wan kesana ra tê  
gotinê, ko dijî zor û zulmê rabin.  
Min bêriya te kiriye  
Dilbixwîn Dara  
Tu nema xerîbî hestiyên min  
birizîne. Tu nema min kor bike,  
bêrîkirina welat. Tu nema min li  
kolan û taxên vê Ewropayê mest û  
serxweş bike...  
Van rojan ez pir bêriya welat dikim. Di xewna min  
de mîna marekî xwe li bedena min digerîne û di rûyê  
min de diqîre: "Bes e! Li min vegere..!"  
Çavên min tijî hêstir dibin, serê xwe di dîwaran de  
lêdixînim û bi dengê kelogirî di gewriya xwe de

dilorînim: "Dayêcan... anê ez biqurban... xwezî ez weke her carê dîsa di hembêza te de bama û min şîrê berê te bimêta... av û nanê van deran bi min dibe jehr, ne dikarim vexwim, ne jî dikarim bixwim... xwezî dîsa te ez di hembêza xwe bilorandama, xwezî bi çîroka "dengê xwe neke Çermo hat... wê gur te bixwin..." xwezî bi wan rojan...

Belê van rojan Kobanê tê bîra min. Hez kirina wê weke gulekê di dilê min de vedibe. Dengê Baqî Xido di guhê min de lêdikeve "Delalê Milanî" û "Edûlê" dibêje... Kemana Emînê Dûman li ser dilê min rûniştîye û ranabe, strana "Kêrê bîne penêr hûrke" dibêje...

Ez ji hemû gund û bajarên Kurdistanê hez dikim, her der bi min Kobanê ye. Weke însanên Kobanê, ez ji hemû însanên Kurd hez dikim, ne tenê ji Kurdan, ji hemû însanan hez dikim... lê bawer bikim, tu der mîna Kobanê bi min xweş nabe.

Kanî ew nivîskarên ku xweşiya bajarê ji wê derê dest bi jiyane kirine, bînin ziman! Kanî Yaşar Kemal, xwediyê Çokurova! Kanî Dona Şoloxov... Kanî Daxistana Hemzatov...! Ez çiqas ji wan nivîskaran hez dikim ku dikarin xweşiya welatê xwe bikin helbest, bikin nivîs û belav bikin.

Ez çî bibêjim, dema ku Kobanê di xwîna min de dikele, ez dest bi xwendina nivîsên Şahîne Bekirê Soreklî dikim. Di nivîsên wî de mirov baştir dikare Kobanê nas bike û jê hez bike. Di nivîsên wî de

mirov dengên hozanên Kobanê bibihîse, mirov dikare şox û şengiya keç û jinên wê derê bibîne, jixwe ez ji we re behsa keras û keftanên jinan nekim, belkî li tu deran weke wan kincan xweşik tune bin. Ez sebra xwe bi wan nivîsan tînim. Ez têra dilê xwe bi ser wan nivîsan de digirîm.

Dema ku ez wan nivîsan dixwînim, ez li xwe vedigerim û ji xwe re dibêjim: "ezê jî binivîsînim", radihêjim pênuşê, lê belê gewriya min tijî girî dibe û weke zarokekî hîskehîsk bi min dikeve.

Berê min tu caran nizanibû ku mirov ewqasî ji welat hez dike, lê dema ku mirov jê bi dûr dikeve, dibe zarokek û bêriya rojên derbas bûyî dike. Bêriya xweşî û nexweşiya welat dike. Niha jî wiha li min hatiye. Temenê min mezin dibe, lê kezeb û dilê min dibin yên zarokan, ez dibim zarokekî ku bêriya şîr û bêhna hembêza dayîka xwe bike.

Niha ez baştir bi êşa Şahînê Soreklî û giryê wî di nivîsan de dihesim. Niha ez ji berê bêhtir ji wan nivîsan hez dikim. Di wan nivîsan de ez bîranînên xwe, dost û hevalên xwe dibînim, ken û giryê însanên xwe dibînim...

Ne tenê Kobanê... ne tenê ji bo min, ji bo her kesî wiha ye. Her kes ji cihê lê çêbûye hez dike, her kes dixwaze li ser bîranînên xwe bigirî, her kes weke min, dema ku welat tîne bîra xwe dibe zarokek.

Berî niha ez li maleke Mêrdînî mêvan bûm. Dapîra malên ku temenê wê di ser sêstî re bû, mîna zarokan

digiriya û digot: "Bila ez bi qurbane Xirbê bim lawo,  
ev der ciheneme lawo, min li wê derê veşêrim  
lawo... min bêriya nanê tenûrê kiriye, min bêriya  
Kutulk û Mehîrê kiriye... min li welat vegeînin  
lawooo"

Min got belkî ez bi tenê wiha dibim hêsîrê bîranînan,  
lê her kes weke min e.

Ez dixwazim wan nivîsan bixwînim, ku navê  
kevirên welat, navê kolan û quban, navê çîçek û  
gulan têde hatine nivîsandin... Ez dixwazim wan  
nivîsan bixwînim, ku min û her kesî li rojên  
zaroktiyê vedigerînin, ez dixwazim wan nivîsan  
bixwînim, ku min di hembêza welat de vedişêrin...

Rojiya bavê min

Dilbixwîn Dara

Kesek weke bavê min rihet, bêdeng, gotinxwes û  
devliken tune bû. Tu caran xerabiya kesekî  
nedixwest. Cihê ku ser lê heba ew ji wê derê dûr bû.  
Di hemû jiyana xwe de sîleyek li kesekî nexistibû -ji  
xeynê me., mûriyek jî neêsandibû. Ji ber vê  
bêdengiya wî gelek caran gundiyan wiha ji bo wî  
digotin: "Bêçare ye, qet nesbîhî mêrên gund nabe,  
heyfa wan simbêlan..." Belê simbêlên bavê min  
hinekî mezin bûn, lê belê vê dawiyê ew sivik kirin,  
mele jêre goti heram e, wî jî weke yên dîndaran bi  
meqesê çerpandin.

Ez ji we re çawa bibêjim? Zarokekî jî dikaribû ji  
devê bavê min pariyê nan derxîne, bavê min tu caran

li dilê wî zarokî nedihîst û nedigot: "Wiha neke..."

Digot: "Belkî birçî ye, ma ku ne birçî be, wê çima were nanê min ji devê min derxîne!"

Ji xwe ez ji we re behs bavê xwe û qereçiyên nekîm, dema ku dihatin mala me, wê rojê li bavê min dibû dawet. Berî ku derbasî gund bibin bavê diçû bixêrhatina wan fikir, ew bi germayî hembêz dikirin û dihanîn mal, kulav ji wan re radixist û cihê herî bilind dida wan. Cixare li wan belav fikir -wî bi xwe cixare nedikisand- û li hal û dema wan dipirsî, dikeniya û bi dengê bilind gazî diya min fikir: "Zelîxe... Zelîxe... mêvanên me ji dûr têne, dewekî sar, qehweyê germ ji wan re çêbike..." Ev karê rojekê û du rojan bû, mala me ji mêvanan vala nedibû, rojekê qereçî, rojekê mele li amîne digeriyan, rojekê parsek, roja din jî gavan û sivanên gund. Rewsa me ya madî xwes bû, destên bavê min jî vekiribûn, dikaribû di rojekê de her tistê xwe li xelkê belav bike. Dema ku bavê min gazî diya min fikir, diya min wiha bersiva wî dida, lê di ber xwe de: "Ezê ziqûmê ji wan re çêbikim! Bila biçin xwe bi qurbanê karekî bikin, ne kor in, ne jî kût in, lê na, carê xerab fêr bûne, heya ku navê ber devê deriyan nexwin têr nabin..."

Navê min diya min Zelîxe bû, dotmama bavê min bû, deh salan ji bavê min biçûktir bû. Jineke rihet bû, devliken û gotin xwes bû, lê tu caran ji mêvanên bavê hez nedikir, kêfa wê ji wan re nedihat. Serê wê

û bavê min her demê li ser mêvanan bû, dema ku wê ser fikir, bavê min bêdeng dima, me bi xwe jî pistgiriya wê fikir, ji ber ku ew mêvan, mêvanên mal di gund de bûn, mêvanên her roj bûn. Diya min, feqîra xwedê ji sibê heya êvarê di kulikê de bû, li cem me ji metbaxê re dibêjin kulik. Bavê min xwarina du rojan nedixwar, diya min her roj ji me re xwarina germ çêdikir. Ji ber ku xwiskên min tune bûn, hemû karê malê, diya min bi tenê fikir. Ji sûtina kincan, firaxan û serê me de bigirin heya bi dotina pez û çêkirina mast, mehîr û penêr. Destên wê ji kar vala nedibûn. Tu caran vala nedibû ku were bi me re li ser sifra xwarinê rûne û bi rihetî xwarinê bixwe. Hemû kar û barê malê li ser milê wê bû. Ji tirsê gotina xelkê bavê min alîkariya diya min nedikir, ditirsiya ku hinek bibêjin: "ketiyê destê jina xwe, îro xwarinê hazir dike, sibe jî wê zarokan bimêjîne..." ji ber vê yekê, bavê serê sefaqê dadikete nava zeviyên, nîvro vedigeriya mal.

Sas fêhmekin, ez ne pesna diya xwe didim ne jî li ser camêriya bavê xwe diaxifim, lê ez dixwazim hûn hinekî taybetmendiyên wan nas bikin. Em werin ser mebesta nivîsandina vê çîrokê. Ez dixwazim ji we re behsa Remezanê û rojiya bavê xwe bikim, ez bawer dikim, wê rewsa bavê wê ji yê bavê min ne gelekî cuda be.

Biborînin, min ji bîr kir ez bibêjim, navê bavê min Hesên bû, niha jî wiha ye bêguman, lê ez qala wê

demê dikim. Xelkê jêre digot Heso, kêfa wî ji vê leqebê re nedihat, lê nikaribû zorê li kesekî bike ji bo ku jêre bibêjin Hesen. Bavê min mêrekî kin û qelew bû. Xwendin û nivîsandina wî tune bû, tenê du salan çûbû li cem xoceyê gund xwendibû. Li wê derê çarpênc ayetên Quranê ezber kiribûn.

Temenê wî nêzîkî çil salî bû. Tu caran pantolon li xwe nedikir, serqot nedigeriya, layîqî xwe nedidît, belkî jî dilê wî dixwest ku kincên Ewropê li xweke, lê serm dikir. Tenê carekê pantolon li xwe kiribû, ew jî dema ku çûbû eskeriyê. Min berê jî got cixare nedikisand, li her demê di berîka wî de pakêt hebû, li nas û dostan, li mêvanan belav dikir, ev jêre bûbû weke adetekê. Di hemû jiyana xwe de ne bi qumarê lîstibû ne jî bi kaxetan, ji vî alî ve gotin li ser nedihate kirin. Dema ku kêfa wî li cih ba diçû bi bi hunek cîranan re bi damê dilîst.

Gava ku me ji gund bar kir û em çûne bajêr, bavê min dikanek di hewsaya malê de vekir. Bi wê dikanê bavê min debara malê dikir. Li bajarê me, kesên ku cih li bajêr nedidîtin ji bo ku ji xwe re dikanekê vekin, diçûn di hewsaya mala xwe de dikan vedikirin, bavê min jî ji wan kesan bû.

Li bajêr jî bavê min dest pê kir ku mêvanan li dora serê xwe kom bike. Ji misteriyên zêdetir li dikana bavê min kesên bêkar û betal kom dibûn. Hinekan ji xwe re li ber devê dikanê bi damê dilîstin, hinek jî dihatin gilî û gazinên xwe dikirin, ji xwe re sebra



xwe dihanîn. Ev li xwesiya bavê min jî diçû. Lê diya min! Ji belaya bavê min xelas nedibû. Diya min vê carê ji sibê heya êvarê ji mêvanên dikana bavê min re dixebitî. Dema ku mêvan li dikanê kom dibûn, bavê min gazî min dikir û digot: "Hayê kurê min, ez te bibînim, here ji diya xwe re bibêje bila çayeke qalind û bi darçîn ji mêvanan re hazir bike. Bi lez ez diçûm min ji diya xwe re digot. Diya min di rûyê min de diqêriya û dida sopa min, dixwest hêrsa xwe di serê min derxîne. "Mêvanên bavê te bila biçin jehrê vexwin... bila biçin xwe bi qurbane karekî bikin û bixebitin, tirba xwe li dikanê kolandine... morika stûyê xwe li wê derê wenda kirine?!" diya min diqêriya û digot, dengê xwe bilind dikir, ji bo ku mêvanên rojane yê bavê min bibihîsin.

Ez nizamim ezê çawa ji we re behsa meha Remezanê û rojîya bavê xwe bikim! Dema ku ew roj têne bîra min ez di cihê xwe de diricifim.

Ezê bi kurtî ji we re qala rojekê ji wan rojên mubarek bikim.

Dîsa meha Remezanê bû. Tîrmeh bû. Agir bi erdê ketibû. Ji ezmanan agir dibariya. Ji germaya rojê û hêrsa havînê mirov nikaribû ji hundir derkeve. Mêjî di serê mirov de dikeland, wê rojê. Di vê mehê de rojiyê dest pê dikir. Di kelekela germa havînê de mirov çawa dikaribû xwe tî bihêle, mini jî nizanibû, ji bo çi bi taybetî di vê mehê de rijiyê dest pê dikir. Welhasil, ew ne karê min e.

Di vê meha Remezana mubarek de, hejmara nexwesan bilind dibû, bi taybetî jî kesên bi temen, weke mirîskê serî di ber wan de diskest û ji ser hisê xwe diçûn, pattr... li erdê diketin. Lê belê dîsa jî rojîya xwe nedisikandin, baweriya wan xurt bû. Em werin ser bavê min.

Di wê meha Remezane de, bavê min dibû weke mozeke sor. Dibû însanekî din. Gotin pêre nedibû. Hesoyê berê yê dilovan û nerm diçû Hesoyekî din dihat. Hesoyê nû, yanî bavê min, mirov newêribû silavê lê bide, hema sor û mor dibû, lêv diricifîn û mîna bombayekê di rûyê mirov de diteqiya. Sebeba vê yekê jî bêguman rojî bû.

Pistî nimêja sibehê, bavê min solên xwe dixistin lingên xwe û berê xwe dida mizgeftê. Berî ku ji mal derkeve diya min jê pirs dikir:

- Ji bo fitaran ez çi xwarinê çêbikim?

Deng ji bavê min dernediket. Diya min careke din digot:

- Ma te nebihîst! Ez çi xwarinê çêbikim?

Bavê min bi hêrs li pas xwe zîvirî û bi dengekî bilind li diya min vegerand:

- Ziqm! Te fêm kir? Ziqûmê çêbike...

Dema ku meha Remezane dihat, bavê min jî bi nexwesiyeke wiha diket, ne di dest wî de bû. Di meha Remezane de ew ji bin îradya xwe derdiket.

Diya min di ber xwe de got:

- Dîsa bi cinan ketiye. Qaso bi rojîye! Ê madem tu

nikarî rojiyê bigirî, madem tu tehemul nakî, çima tu digirî û xwe wiha rezîl dikî! Tu dibêjî qey kesekî zor lê kiriye... Eger ku xwedê jî rojiya te qebûl bike, bila ez bi her du çavan kor bibim.

Bas bû ku bavê min nebihîst, eger ku bibihîsta, xwedê dizanibû wê çi bianiya serê diya min.

Ez di nava nivînan de bûm. Min koseyekî lihêfê rakiribû û bi dizî li wan guhdarî dikir. Min newêribû serê xwe derxînim û eskere li wan guhdarî bikim.

Bawer bikin eger ku bavê bi min bihesiya wê hestiyên min bas nerm bikirana. Bi qasî ku ez ji qayîsa bavê xwe ditirsiyam, ez ji tistekî din neditirsiyam, di meha Remezana mubarek de min her du sê rojan carekê çend qayîs ji dest wî dixwarin.

Wê rojê diya min li gora dilê xwe xwarinek amade kir. Ez vê ji we re bibêjim, di meha Remezane de tu caran xwarina ku diya min çêdikir, li xwesiya bavê min nediçû, her carê jêre behaneyeke didît û sereke ne plankirî derdixist. Di dilê diya min de bûbû hesret ku rojekê bavê min ji diya min re bibêje "destê te sax bin", her demê digot: "ev çi ye, ev çi ziqûm e..."

Ji bo ku hinekî xwe hênik bike, ji sibê heya êvarê serê bavê min di bin ava sar de bû. Her kêliya ku te ew bidîta, misînê avê di dest wî de bû û bê rawestan av bi ser serê xwe de dirijand. Lê di çar pênc deqeyan de serê wî zuha dibû, dilopek av jî li ser serê wî nedima. Dibû kufe kufa wî, di hundir dikanê de diçû û dihat û xeber digotin. hinek tist di ber pozê

xwe de digotin.

Ji tîbûnan ezmanê bavê min bi devê wî ve dileziqî. Lêvên wî diqelisîn, çavên wî di kortikan de wenda dibûn. Weke du dendikên zeytûnan her ku diçûn biçûk dibûn.

Bavê min li rojîgirtina xwe posman dibû, lê êdî carê dest pê kiribû, nediû ku dev jê berde û xwe di nava xelk û cîranan de rezîl bike, berê xwe dida ezmanan û bi dengê bilind digot: "Malav, xwedêyo! Ma te ji xeynî vê mehê tu meh nedîtî ku tu têde vê Remezana mubarek bînî?! Ma çima te Qurana serîf di meha zivistanê de nesand, ma me bi te çi kiribû ku tu me wiha rezîl û riswa dikî?!" Pistre li xwe dizivirî û di ber xwe de digot: "Li me û hicetan digere, vê kele kela germa havînê, mirov li kafiran jî tistekî wiha nake, ma çi hatiye serê me ku em xwe mîna deveyan xwe tî û birçî bihêlin..!"

Germayiyê êdî mêjiyê bavê min leqandibû. Bi dengê bilind gazî min dikir: "Kuro..! Zû be, vî misînî tijî ava sar bike û bîne, dereng nemîne, eger ku tu weke cara berê dereng bimînî, ezê te..." Bi lez min misîn tijî ava sar dikir, du qalib bûz dixistin ser û ji bavê xwe re dibir, ez bernedidam, min bi qirika misîn digirt û ew ava cemidî bi ser serê wî de dikir, rihet dibû, hinekî tîbûna wî diskaset, lê belê gelekî dirêj nedikir: "Zilm e, rezalet e, dijmin jî tistekî wanî nayne serê miriv... eskere, eskereû dûze dûz, riya cinetê li pêsiya me digire... ma ev jî hal e!" ji xwe re

bi hêrs digot.

Di meha meha Remeznê de misteriyên bavê min gelekî kêr dibûn. Ezê ji we re sebaba vê yekê jî bibêjim.

Jineke cîrana me hebû, navê wê Xedrê bû. Bî bû. Du zarokên wê hebûn. Mêrê wê dev jê berda bû û çûbû ji xwe re zewicî bû. Xedrê li ser zarokan mabû. Her du zarokên wê diz bûn, ji zaroktiya xwe de fêrî diziyê bûbûn. Tistên ku didizîn li cem diya xwe vedisartin, li xwesiya wê jî diçû.

Xedrê jineke sermêrokî bû. Ji civata jinan bêhtir kêfa wê bêhtir ji civata mêran re dihat. Ne serm dikir, ne jî fedî. Te kengî ew bidîta, benîst di devê wê de bû û dibû cerqe cerqa wê, dicût. Dema ku bavê min ew di wê rewsê de didît, his ji serê wî diçû. Jê nefret dikir. Dîsa rojêke remezanê bû. Ses heft kes li pêsiya dikanê rûnistibûn. Hemû jî bi rojê bûn. Ji xwe re diaxifîn, suhbet dikirin. Suhbeta wan weke her carê dîsa yan li ser buhabûnê bû, yan jî li ser filan û bêvan kesî bû. Li belê wan rojan milet zêde li ser keça meleyê mizgeftê diaxifî, keça wî bi xortekî reviya bû.

Xedrê kete hundirê dikanê, nedigot rojiye ez benîstê xwe ji devê xwe derxînim, tistekî wiha nedihate bîra wê.

- O... ho... masellah dîsa dikan dagirtiye, got û derbasî hundir bû.

Ji yên rûnistî yekî got:

- Em li benda te bûn Xedrê.

- De here kalê heram, Xedrê kenîya û got, kêfa wê gelekî ji gotinên wiha re dihat, av bi devê wê diket. Gotin avêtin hev. Her du alî jî bi gotinên hev kêfxwes dibûn.

- Binêre Xedrê! Min jin berdaye, te jî mêr, ka were di vê meha mubarek de em xêrekê bikin. Bavê min di bin çavan re li wî dinêrî û bi dengekî nizim di ber xwe de digot: "Munafiq!"

- Ez! Ez bi heramekî weke te re bizewicim?! Tu di xewna xwe de jî tistekî wiha nabînî, Xedrê mîna keçeke çarde salî bi delalî got. Ez sed salî bi tenê bimînim jî bi pozmezinekî weke te nazewicim.

- Xwe sas neke, pistre wê tu posman bibî ha... fedî neke, kesekî xerîb tune ye. Eger ku em di vê meha mubarek de bizewicin, emê bi hev re di sala pêsiya me de bi îzina xwedê biçine Hecê. Riya cinetê li pêsiya me vedibe Xedrê...

- Cineteke ku xirpoyekî weke te lêbe, ezê biçim cihenemê.

Mêrik di ber xwe de kire nirçe nirç û got:

- Gotin bi jinebiyan re nabe, min jî dev ji te berda.

- Tu dev ji min bernedî, ezê çar pçnc diranên ku di devê te de kurmî mane, hûr hûrî bikim.

Yên din bi hev re kenîyan.

Bavê min di bin çavan re li her duyan meyizand û got: "Xinzîr!"

Xedrê ji bavê min nêzîk bû û bi dengekî qebe, weke

ku li bavê min emir bike:

- Kîlok mast Heso!

Weke ku nebihîstibe, bavê min deng ji xwe dernexist. Lê bawer bikin ev gelekî li zora wî çû. Jixwe tu caran nedixwest ku Xedrê nêzîkî deriyê dikanê jî bibe, tu caran bavê min û wê li hev nekiribûn, ne kêfa bavê min ji wê re dihat, ne jî kêfa wê ji bavê min re dihat, ji hev hez nedikirin. Ji ber ku ew siq siq dihate mala me, her roj di navbera bav û diya min de ser hebû, bavê min bi ser diya min de diqêriya û digot: "Bi nod û neh navên xwedê, eger ku ew careke din were vê malê ezê lingên wê bisênim... Ji xeynî fitne û fesadiyan ew ji tistekî din re nabe..." Lê belê tevî vê yekê jî kêfa me zarokan gelekî ji wê re dihat, ji me re çîrokên cin û neysiziyên digot, me newêribû em ji bavê xwe re bibêjin ku kêfa me ji wê re tê.

Bavê min bersiva wê neda, Xedrê ji xwe re fersend dît ku gotinekê bavêje zilamê rûnistî:

- Eger ku ewê (?) te heba, jinikê dev ji te bernedida.

Mêrik di bin simbêlan de kenîya û got:

- Heye... heye... dema ku tu hatî wê tu bi çavên xwe bibînî.

Xedrê di ber xwe de kenîya, bersiva wî neda.

- Mastê te yê duh tirs bû ha! ji bavê min re got, min hemû rijand.

Bavê min li behaneyekê digeriya, ji bo ku wê biqewitîne, jixwe ji tîbûnan çavên sor bûbûn. Bi hêrs

serê xwe rakir, di bin çavan re bi kîn li Xedrê  
meyizand û got:

- Malê min ev e, kesek bi zorê nade te, got.
- Xwe aciz neke Heso, me tistek negot.
- Weke her roj bi ser min de neke pite pit, tu mêt dibî lê nabî?
- Dibim... dibim, kîlokî.

Bavê min bi heskê mast xiste kîsê naylonî. Devê kîs girêda û da dest Xedrê. Xedrê bêku heqê mêt bide bavê min kîs ji dest wî girt û kir ku biçê. Bavê min kîs ji destê xwe berneda:

- Bi kuve! Te heqê mêt neda, bavê min got.
- Wiss! Ezê pisrte bdim te, binivisîne.
- Nabe, bavê min got.
- Ma em reviyar e! Ezê sibe bidim te.
- Min got nabe, heya ku tu peran nedî, mast tune ye, bavê min bi hêrs got.
- Wîî! Em cîranê hevin Heso, ma te dinya nedîtî ye! Ev pir li zora bavê min çû.
- Zimanê xwe dirêj neke û vê rojiya Remezanê devê min veneke, kîs berde, bavê min got.

Hinekî li ber hev da. Xedrê nedixwest kîs berde, bavê min jî, te ew bikustiba kîs di dest wê de bernedida.

Di vê navberê de, yekî ji yên rûnistî, ji bavê min re got:

- Bila bibe Heso, emê tistekî din ji wê bistînin.
- Bavê min di ber xwe de hinek tist gotin. Xedrê jî



devê xwe tijî xazî kir û avêt di devê wî zilamî de lêxist, yên din bi dengekî bilind kenyan.

Li dawiyê bavê min kîsê mêst ji dest Xedrê girt. Lê belê Xedrê jî ne hindik bû, bi her du destan xwe avête kîs, bavê min berneda, Xedrê kisand... û li dawiya dawiyê, bavê min ku mîna fisengekê hatibû dagirtin, bi qirika kîs girt, rakir û di erdê de lêxist, weke bombeyekê deng jê derket, her der sipî kir, mêvanên bavê min jî ku ji xwe re temase dikirin, nikaribûn xwe ji teqîna kîsê mêst xelas bikin. Mast li pêsiya dikanê belav bû. Bavê min dest bi xeberan kir, xeberên ku tu caran negotibûn, gotin. Bavê min bi dengekî bilind gazî min kir:

- Ker oxlu ker, zû be! Misîne avê bine û vê derê biso... tu nema bû dîsa ev îblîsa biba sebaba sikestina rojiya min...

Li bayê bezê min pêsiya dikanê paqij kir.

Ev ne tistek bû, lê dema ku em li ser fitaran rûdinistin! Ezê wê jî ji we re bibêjim.

Em li benda teqandina topê diman. Lingên bavê min erd nedigirtin. Belkî di deqeyekê de sed carî diçû ber deriyê derve û dihate hundir. Sebir nedikir ku top lê bidin û ew jî fitara xwe veke. Tehemul nedikir, dihat li ser sifrê rûdinist, tasa avê dixiste destê xwe û li ezmanan dinêrî, dixeyidî: "Dîsa çi bi van bênamûsan hat! Her roj vê rezaletê tînin serê me, bi me dilîzin, bi xwedê dilîzin, ji bîr dikin ku biçin topê biteqînin... tu nema em ji tînan bifetisin..." di ber xwe de digot.

Pistre li min dizîvirî û digot:

- Hele ka biçe li salnemê binêre, ka kengî fitar in.

- Hîn sê deqe mane, min digot.

Bavê min bawer nedikir, bi min re aciz dibû:

- Derewan neke, bas binêre, ma tu kor bûye, çawa sê deqe mane!

Ez diçûm min careke din dinêrî:

- Sê deqe mane bavo, min bi îsrar digot.

- Çawa bû ev! Çi bi melê bênamûs hat! Her roj di vê deqeyê de azana dixwend, mir çi bû! Ez wî bas nas dikim, kesek weke wî sextekar tune ye.

- Belkî saeta te li pês be bavo, min bi tenazî got, ev gelekî li zora wî çû.

- Te çi got?! Saeta min sas be! Eger ku ez rabim ezê serê te têxim vê tencika tirsikê ha...

Ziman bi ezmanê devê bavê min de dizeliqî. Careke din tasa avê dibir ber devê xwe û di ber xwe de digot: "Seytan dibêje vexwe..." Diya min bi dengekî nizim ew hisyar dikir:

- Sebir bike Heso, gunehe, avê nebe ber devê xwe.

Bavê min berê xwe dida diya min û bi dengekî

bilind digot:

- Disa fitweyan nede! Ez dizanim çi dikim.

Dema ku top diteqiya, bavê min ji kêfxwesbûnan

"Bismillah" ji bîr dikir, du sê tas av li pey hev

vedixwarin, pistre êrîs dibire ser kevçî û bi ser

tirsika bamiyan diket. Dixwar nedixwar têr nedibû, li

pey hev dixwar û vedixwar. Diya min di bin çavan

re li wî dinêrî û di ber xwe de digot: "Wê xwe pê bikuje" û dengê xwe bilind dikir: "Hêdî Heso..! nareve... nareve" Bavê min nedibihîst, hisê wî li ser xwarinê bû.

Heya ku meha Remezanê diqediya, hal û karê me jî her roj ev bû.

### BI ÇAYDANÊ HEVALA

Qedrî Dersilavî: dersilav58@hotmail.com

"Bi çaynadanê hevalan min gayê te ne dîtiye! Bi çaydanê hevala pezê û golikên min ne ketine rez û bîstan (bostan) ê we. Bi çaynadanê hevalan mirîşka we li mala me hêk nekiriye, Bi çaynadanê hevalan ne zarokên me ne ên ku şibaka we şikenandin e û hwd."

Belê dengê we tê min, hun niha dibêjin "ev çi ne, ev tu çi sond û peymanan dixwî, ma kê doza sondan li te kiriye? Kê gotiye tu ketî bîstanê me, te golika me diziye? Lê ev çi tewir sondin?" De wele me sond û peymanên bi vî tewrî ne bihîstine. Belê min jî ne bihîstibûn, min jî sond û peymaneke bi vî tewrî nizanibû heta ku

Rojekê riya min bi gundê Memoka ket (Memoka girêdayî Stewrê navça Mêrdîn e) û ez du rojan li wî gundî mam. Memoka gundekî kê m av lê şênkahiya dar, devî, bihîv, rez, bîhok, guvîj, беру, qeswan, hejîr tuhok û belalukan pir bu. Ev gund di nava newaleke ku dikeve qontara çiyayê Stewrê de ye. Gelê gund jî tev welatparêz bun. Gundekî bi tifaq û biratî bû.

Gundîtî û cîrantiya wan xweş bû. Di herdu rojên ku ez li vî gundî mam, min tu taybetiyên wanî girîng nedîtî, tenê vê sonda wan (Bi çaydanê Hevalan) pir bala min kişand. Ez bawerim bala we jî dikşêne. Dema ku yekî bixwesta hevalê xwe an dijberê xwe bide bawerkirin (înaniya wî bêne) sonda wanî serekeyî û herî mezin ev bu: "Bi çaydanê Hevalan" ji ber ku min tu sond û peymanên bi vî tewrî ne bihistibun, min miraq kir. Û ji wan pirsî :Min got gelî gundiyan, ez li heremê welat geriyame. Min pir cureyên sond û peymana bihistine. Li gundekî sonda wanî herî mezin, digotin "Bi sed hezar Qur an" li gundekî din digotin "Bi tirênek Qur an" li yekî din digotin "Bi ucaxê Şêx" li yekî jî digotin "Bi beroşa mala Şêx" hina digot "Bi kitêba mala Seyda" hineka jî digot "Bi çira Elî Mihemed" hineka digot "Bi kevirê Hecê" hinika ji digotin "Bi roka li ezman" Hina digo "Bi rewza Şêx Ebdilqadir" hina digot "Bi ucaxên mala Bubê" Hina bi ucaxên mala Bokarkê, hineka bi ên mala Şêx Hamid sond dixwar. Hinekan bi rojê, hinekan bi heyvê sond dixwarin. Lê min heta niha sondeke bi vî tewrî ne bihîstî ye. Ka ji min re çîrok û serpêhatiya vê sonda xwe bêjin. Ev hun çima bi çaydanê hevalan sond dixun?

Gundiya çîroka vê sonda xwe wiha ji min re şîrove kirin.

Piştî despêka telefizyona Med'ê sê mehan şunde apê Biro antêna stalîte (uydu) kirî û anî li gund saz kir.

Me hemu gundiyan jî bi qabloyan kişande malên xwe. Ên ku malên wan dûr bûn jî her şev li şevbêrkên cîranan û mala apê Biro bûn. Û her şev temaşa biçûk mezinan tevan temaşekirina telefizyona MED ê bû.

Wê demê ji panzdeh rojan carekê bernama "Welatê Rojê" dihate weşandin. Mijara wê jî, jiyana û çalekiyên Şervanên Azadiyê bu. Gundiyan me jî tev welatparêz û dilxwaz bun, lê heta wê demê jî kesî ji gund, bi çavan û zindî şervanên azadiyê nedîti bûn. Û Ji ber vê jî hemu çik, pir miştaqê dîtin û naskirina wan bun. Îcar gava ku di telefizyonê (di bernama welatê rojê de) derdiketin, kes jê nedima. Ji mezinan heta biçûkan bi çar çav li telefizyonê temaşe û godarî dikirin. Bi godarîkirinê tenê bimênin baş e. Îcar her sibehan piştî bernamayan girîng (weke welatê rojê) gundî heta çend rojan qal û qirêtkî bernamê dikirin. "Bernama welatê rojê îşev çî xweş bû, we jiyana şervanan dît" û hwd.

Dîsa rojekê, piştî bernamayeke "welatê rojê" gundî ketine qirika hev. Her gundiyeke bûbû evîndarê û miştaqê tişteki ji bernamê. Ji yê ku bûbûn hişmetqê kincên şervanan, ji yê ku bûbûn, hişmetkarê şemlên wan, ji yê ku bûbûn evîdarê rextgirêdanên wan.... Bi rastî jî pirên gundiyan ji jiyana şervanan metal û berziqî bûbûn. Hina dîgo "te hevîrkirna hevalan dît, te dî çî xortekî spehî bû û hevîr dikir?... ," hinan digot "te talîm û perwerda wan dît? Bi rastî jî

dişîbiya artêşê... hina digot "Na wele teştâ wanî şemadan çi xweş bu. Hineka digot "En tiştê wanî xweş savara (gîrar) wanî liser kuçik (tifikê) bû, niha çi bi tam û çêj e. Ê din digot "malmîrat ma ne ew gîrar rijî (bêrun) bu. Hina got "Lê konikên wanî nayîlonî!... " hinekan got "Ma çi weke wan şemlê ku li piştâ xwe dipêçin heyecanê dide mirov? Hinekan got "Ma gelo wan cilên (kincên) sipehî cewa peyde dikin û didin dirûtin? Êdin bersîv dida, digot "Dîno ma ne terziya wan jî resmiye (taybete). Ji xwe ên ku bûbûn evîndarên çek û sîlahên wan, bêhejmar bûn. Kelandina şorba wan jî dilê pirî gundiyan sohti bû. Girêdana şervanên keç devê tevan ji hev biri bû. Dema ku hevalên keç di ekranê dixuyan hemu gundiyan çvên xwe li keça Silê Mencê digerandin. Lewre hîna jî piran bawer nedikirin ku keça Silo ketiye na refên şervanan.

Te digot qey karê wan ew e; her hafteyê, piştî bernamê her kesê (her yekî) a xwe digot. Heta ku bernameyeke din bi hata, di gund de qal û bas, qirêtîk û nirxandina bernamê bû. Lê heta bernama din kesî bi ser kesî ne dixist. Herkesî di got fikra min rast e. Lê carek dîsa piştî bernameye kê niqaşên gundiyan tund bûn û li ser vê mijarê hevûdin pir zivêr jî kirin.

Di dawî de gundî ji bo li hev bikin, biryarek girtin ku herin ji hinekên zana bipirsin. Bê ka di jiyana şervanan de tiştê herî balkêş û sempatîk çiyê. Çun ji

çend zanayên şoreşger pirsîn. Dîsa wan jî her yek tiştêk danê pêş. Gundî bi wan jî qani nebûn,. Di dawî de gotin "em herin ji Elodîno bipirsin. Bera ew şerîeta me bibbire, me li hev bîne."

Elodîno jî dîne gundê wan e. Lê gotin û kiryarên wî ji ên gelek biazilan rast û durist in. Kesî rojekê gotineke tahl û derew ji Elodîno ne bihîstiyê.

Elodîno mirovekî dîn jî be pir mirov dibêjin ku ew weliye. Ne mal heye, ne milk, goh li çek û xwarinê jî nake. Pir caran bi roja birçî dimêne, heta hinek bi zor xwarinê nedinê, ew ji kesî tiştêk na xwaze. Ji destê kesî tiştêkî nagire. Kêm xeber dide, lê her gotineke wî "weke ji kitêbê be" Pir dicîh de dipeyîve, Elodîno car caran ji gund dertê, berê xwe dide çolan û bi rojan nayê gund. Gundiya çîroka sonda xwe ji min re wer domandin.

Em çûn cem Elodîn, me jê pirsî, me got Elodîn te jî hefta borî bernama Welatê rojê temaşe kir? ( ji xwe car carana hunda dibe lê gava dibe wexta bernamê te dî li mala apê Biro hazire) Got belê min godar kir.

Me dîsa jê pirsî, me go bi a te ji tiştên hevalan, ên herî balkêş, xweşik û pîroz çî bu? Li me vegerand û wer got. Çima hun nizanin tiştê wanî herî balkêş û pîroz çî bu? Me go na em nizanin. Wî jî wer vegerand: Nabêjin gundî dînin û korin jî, dibêjin Elodîno dîne?...Ma bê aqilno tiştê wanî herî xweşik û pîroz ew çaydanê wanî bafunî ku derve û hinderê wî ji hev nayê cuda kirin, ji tenî û qilêrê bûbû weke

qafurê. Û Elodîn gotîşna xwe wer dewam kir "Hun dizanin Ew çaydan rumeta meye. Hec û zîyaretgaha meye." Piştî gotina Elodîno me teva ew pejirand û ji wê rojê û şunde ev sond buye peymanî meyî herî bilind. Ev ruwê sê salane di gundê me de kê bi vê sond xwaribe vir derneketiye. Û her kes pê bawer buye. Niha li gundê me ku bi çaydanê hevalan hate sond xwarin avên çema disekinin.

24.08.1998

GUNDÊ ME

Qedrî Dersilavî: dersilav58@hotmail.com

Gundê me, gundekî xelbe û şên bû. Bi dar û ber, bi ceh û gemin û şênkayî bû. Erda wî bi bereket bû.

Cureyên fêkî û zêzewatan jî lê pir bun. Lê qusureke gundê me hebû: di gundê me de şer, pevçûn û berberî kê nêd bû.

Di vî gundî de, kê bi kê garibana, diranê kê bi kê de biçuna, tade û zilm lê fikir, ew talan fikir. Dest dida ser terş û eyalên wî. Lê tenê mala Hecî biro ne werê bûn. Yanî te digot qey mala Hecî biro, ne ji vî gundî e. Digel ku pir û bi hêz bûn jî, dîsa tade û zilm li kesî nedikirin, terş û talanê kesî ne dixwarin, çavên xwe bera mal û namusa kesî ne didan. Weke mîhan bûn.

Lê belê çend mal û azbetên dîtir hebûn, bê esl û bingeh bûn, her ku fersend bi dest dixisitîn, tade û pêkolî li mala Hecî Biro dikirin. Mal û pezên wan, terş û talanên wan di dizîn, çav bera erz û eyalên



wan didan. Mala Hecî, ewil, di ber xwe didan, ne dihiştin ku xelk û alêm, der û cîran, mal û milkê wan talan bikin. Lê demek şunde, bi sedem vê henunî û bêdengiya wan, der û xelkê zora wan bir. Bi darê zorê tev kirin dîl û esîr, xistin bin bandora xwe. Li mal û milk û hemu dewlemendiya wan bûne xwedî. Êdî bêtifaqî ketibû nev zarokên Hecî Biro, nema karibûn di ber xwedin, mal û milk û eyalên xwe biparêzin. Bûbûn esîr û bindest. Bi vê rewşê, sal û zeman dibuhurin.

Car, caran zarokê Hecî Biro yeko- dido, diberxwe didin, li hember cîranên zorba serî radikirin, digotin ev tiştê ku hun dikin ne li rê ye, zilme, zordarî ye. Lê ji ber ku bi serê xwe bûn, bê tevahiya bav û birayên xwe bûn, bi ser nedikeitn. Di pey vê rewşê re dîsa sal û zaman derbas bûn. Her ku diçû zarokên Hecî Biro jî, pir dibûn û hîna jî jar û reben bûn. Lê ro bi ro, li çara serê xwe, ji bo azadî û serexwebûna xwe di fikirin, di şêwirin û lêkolîn dikirin. Her yekî, ji xwe re tiştêk û çareyek difikirî û şîrove dikir.

Di dawiya dawiyê de gotina yekî ku navê wî Seyîtxan bû, ji teref pirên azbetê de, hate pejirandin. Seyîtxan ev digot: Divê em îro bi dijimnên xwe re şer û pevçûneke dijwar bikin. Lewre "ne bi şer be dijmin naçe der" Weke hemu malbat û azbetan, yek dido ji zarokên Hecî Biro jî newêrek derketin. Yek ji wan jî Ezîzo bû. Ezîzo digot: ez nikarin şer û prvçûnê bikin, em ne ê şerin. Azadiya bi şer û

pevçûnê, min navê. Û mala xwe ji gund barkirin, çû gunde kî cîran. Ji xwe re qesr û qonax çêkirin, zewicî, bû tucar û maldar, xwedî zar û zêç, milk, mal û pere. Nema gund, bav, bira û erda wî hate bîra wî. Gerçî car caran ku bi tenê dimA, ji derdorên xwe re bas û qala gundê xwe dikir, lê rojekê nehat gund û axa xwe, ne jî pirs û ziyareta bav û kalên xwe. Car caran henek û tinazên xwe, bi malbat û azbeta xwe dikir, digotin " Tu li wan, tu li halikê wan Ev çi şer, ev çi pevçûne?" Lê xwedê heye... carna, dema ku şer xweş dibû û ku bira û pismaman zora dijimin dibir, wî jî hêvî û gumana ax û erdên xwe dikir, di kozika xwe de deng ji xwe derdixist, digot, "hey birano ji bîr nekin, ez jî birayê we me, min jî ji bo vê xakê ked û emek daye. Demek şûnde ku gund bédeng û sehle bû, hate, mala xwe dixiste xibekê Hesenê Çolo, digot belkî erd û milkê gund bêne tewzî kirin, ew jî ji xwe re parekê bigre û bibe bivroşe, heke hêja (pir) be pê bînayeke bîst û pênc tebeq, li Stabbolê bistîne. Lê ku ne hêja (hnik) be çend şevan ji xwe re pê kêfê bike. Lêdema ku şer û pevçûn zêde bû şevêkê berî roj bavê destek livînên qetqyî bi hayela linga, avête ser kerê reşik û "ligo qurbano" ne kesî dizanibû ku ji wî gundiye an na.

Xirbekê Hesenê Çolo, xanîkekî xerabe, li derê gund bû, di meha Temmuz û Tebaxê de jî dilop dikir. Her ku gundiyan gavan, ji gundên xerîb digirtin, ew tanîn malên wan dixistin xirbê Hesenê Çolo û, ku

qewlên (süre) wan diqediyar, dîsa bar dikirin,  
diçûne gundê xwe

Belê rewşa Ezîzo ev bû û malbata wî jî di şer û  
pevçûnê bihirî, bêhn û nifşik li wan çikiyan. Bi salan  
şer û berberî kirin. Mal, milk û hemu dewlemendiya  
xwe ji dest dan. Ji malbatê kesî bê derb, birîn kor,  
qop û seqetî nema; lê ku mirov li bejn û bala Ezîzo  
dinihêrt weke ku nu ji hêkê derketi be, ne derb, ne  
serşikandinek, ne jî seqetiyek lê nîn bû. Zîqîna  
kudera wî, zembereka seata zêr, di ber de, di  
çirisand. Destên wî weke destê şêxê Serhaniyan,  
weke pembo û hevrîşim, nermik û nazik bûn, heta  
roja îro jî ne ketine ava sar û germ.

Seyîtxan û malbatê jî ro bi ro biryar û qerarên cur be  
cur digirin, li çareserî havilekê digerin.

Pir sal û zamana çûn, kesî pêjn û hêswa Ezîz'ê me ne  
kir. Lê piştî ku malbat di şer û beberiyê de ko bûn,  
pişt û çong li wan şikiyan, xelk û alemê jî, ew  
mafdar kirin, gotin gundîno ma ne eyb û şerme hun  
tadê li vê malikê dikin, hun bi vê zilm û zora xwe  
neheqin. Dîsa rewş sehal (sakin) bû, mala Hecî Biro  
û gundiyan dest bi pez û cotbariya xwe, dest bi der û  
cîrantiya hev kirirn. Ê bû qala lihevhatin û aştiyê,  
me dî postevan nameyek ji Ezîz'ê me anî. Ew Ezîz'ê  
ku ev ruwe pîst saliyê kesî li van dera pêjna wî ne  
kiriye, hêswa wî ne dîtiye, ne di şer û pevçûna de û  
ne di serhildan û berxwedanan de. Di nama xwe de,  
dibê "Ez ne qaîl û raziyê vê rewşê me, ez tu aşti û

lihevhatina napejirênim, ev qusur û kêmaniya azbetê  
ye" di dawiya mana xw de jî, fort û pesnê xwe dide,  
dibêje, ezî saxî ne mirî, we ev tişt kiriye. Îcar Ezîz'ê  
me, pê ne qaîle. Dibê ku hun tirsok û revokin. Hun  
çima şer û pevçûnê na meşênin, çima we dev ji vê  
rewşê berda, hun ji tirsarî hî û canên xwe paş de  
vekşiyar e.

Li ser vê rewşê Pîra Meyro kilamek derxistiye, di  
kilama xwe de wuha dibêje:

Hayê li min hayê

Çima gelo carkê derba me lê nayê.

Şer û Egîr xistine ben û qeyda.

Ji novde fort û pesnê xwe didin, kêlik û çewalê kayê.

Hayê li min felekê.

Te bê sirê bê henekê

Ji mere bûyî kul û keder

Ji xelk û alemê re cennet û Birca Belekê.

Çi bêbextî, bê qerarî,

Çi dil reşî, dil xedarî

Hevalê firek û fortoka

Lê ji mêr û egîtan re neyarî

Felekê

Ezê nemrim bi vê gulê, bi derbê.

Ezê bimrim bi vê kulê, bi vê kerbê.

PÎRA EDUL

Qedrî Dersilavî: dersilav58@hotmail.com

Dema ciwan bû, bûkeke kurî kej bû, rind û bedew

bû. Sor û sipî dikir, gure gur jê diçû, fistanên gul

gulî weke zînê caniya lê di edilî, çarika sipî dor morî  
bi ser biruhên qeytanî de dişildiqîn. Xingîna morî û  
mircanên sityê wê weke estromanên sazbandan bûn.  
Tiliyên şimişimî xwîn di wan de xuya dikir. Şeqîna  
şimikên wê weke erbana sofî Beşîr bi ritm û temtêl  
bûn. Fîstanê gul gulî û bi qerme heta çongan kin li  
ser bedena wê dilerizî. Poz û biruhên li hevhatî weke  
bîrdara (anit) azadiyê bûn. Meşa wêyî werdekî dilê  
her kesî dihelend.

Xelkê ew bi tiliyan rayî hev didan, xweşikî û  
bedewiya wê li tu kesî nîn bû. Li gundên der û  
cîranan jî bas û qala xweşikiya bûka mala keya bû.  
Navê wê Edlayê bû, Edla, bûka mala keya bû. Edla  
jî di ferqa xweşikî û bedewiya xwe de bû, dizanibû  
ku çavên hemû gundiyan (ne bi xerabî) li ser e, ji ber  
wê jî li xwe miqate û haydar bû. Tucar bêyî çarika  
şuştî û morîkirî, beyî fîstanên bi qerme û çavên  
kilkirî dernediket derve. Edla jinek pir bi xurur û ji  
xwe razî bûn. Ji ber vê rewşê xwe Edla bi keç û  
bûkên gundiyan re ne dikete têkilî û bi wan re  
hevaltiya ji dil danetanî. Lewre dê rumeta wê  
bişikiyana, ewê jî bibûna jinek ji rêzê. Dema ku ji  
kaniya guynd av dikşand tucar pêşî nedida qîz û  
bûkên gundiyan. Weke hespa kihêl tim li pêşiya wan  
bû, ji tevan re sermiyantî (mezinantî) dikir. Kuzê avê  
dida ser girtika milê xwe, çengê çepê dikire destik  
jêre û milê rastê bi ahengî dihejikand, weke hespeke  
kihêl ku avê di zikê xwe de neçelqîne dimeşiya, xelk

û alem li meşa wê hişmetkar bûn. Sofî Biro tim digot: “Maleve! Wele vê bûka mala keyê nav rûmwet ji jin û bûkên me re ne hiştiye.

Lê Edla, îro pîr û kal bûye, pişt ketiye ber, tewiyaye, diran nemane, çav jî hew dibînin, dest dilerizin, guh giran bûne, buye pîreke heftê Salî. Belê nema kes basa wê dike, ne xweşikî û bedewiya wê ne meşa wêyî kihêl û werdekî û ne jî sermiyantiya wêyî qîz û bûkan. Navê wê jî guheriye, kes nema navê wêyî Edla jî dibêje (ku bi gotina wî re avên çeman disekinîn) Edla buye Pîra Edul.

Ka em bêne ser bê çewa Edla bû Pîra edul.

Edla û zilamê xwe ji gundê Sîsê bûn. Rewşa wanî eborî ne pir baş jî be debar dibû, rewşa wan ji a pirên gundiyên xwe baştir bû. Çewa be mala keya bûn. Lê piştî çend zarokên wan çê bûn Edul û zilamê xwe qîma xwe bi gund ne anîn û berê xwe dane bajarê Amed. Ji xwe li gund jî bimana tu dahl û zeviyên ku debara xwe pê bikin nîn bû qene li bajêr belkî ji bo zar û zêçên xwe pêşerojekê hazir bikin. Hatin li Amedê niştecih bûbûn. Zilamê Edla ji xwe re geh beqalî geh êrxatî kir lê pir bi ser neket. Ne zilamekî pir bi libak bû. Edla li gorî weke weşikî û delaliya xwe hebû. Di warê eborî de li ber barê zilamê xwe rabû û di warê eboriyê de jî pir alîkarî pêre kir. Çek dirûtin, derzî li xelkê xist, hekîmî kir, pîrikî kir û gelek karên cur be cur kir. Êdî debara wan hêdî hêdî baş dibû. Di serî de (dema li gund bûn) Xwedê Çar

keç dane Edla lê ji ber ku zarokên wêyê lavîn  
çênedbûn, pir li şêx û mişayîxan, li ziyaretan geriya.  
Di peyre Xwedê du lav jî dane wan. Di pey çêbûna  
herdû lawan re rewşa wanî eburî jî hîna baştir bû.  
Edla û zîlamê xwe şad û bextiyar bûn. Kêmaniyên  
wan ne pir bûn. Ji xwe Edla weke bedewiya xwe  
jineke çeleng jî bû. Ji destê wê her kar dihat, weke  
dirunê, pîrikiyê, hekîmiyê, dermankirinê û derzî  
lêdanê. Karibû bi van kara nanê xwe û zarokên xwe  
derxe. Heta ku zarok firoke bûn. Keç zewicîn  
gihîştin mal û eyalên xweyê esasî. Mane Edla,  
zîlamê xwe û herdû çîçelasan. Weke ku tê gotin  
“Xwedê dawiya emrê mirov bi xêr bike” lê mixabin  
Xwedê dawiya emrê Edla bi reş gerand. Rojên reş di  
pey re tên. Piştî 12 êlunê hezar nehse û heştê, kurê  
mezin ku navê wî Barî bû, bi sedem pîrsgirêkên  
siyasî derket derî welat û hew xeberek jê derket.  
Weke Barî wê demê pir mirov ji welat revî bûn, lê  
pirên wan an paşde vegeriyan an ji dayîk, bav û  
malbatên xwe re xeber nuçe şandin, di derheqê xwe  
de agahî gihandin. Lê tu serî û berate ji Bariyê Edla  
derneket, ne wî xeberek şand, ne jî heval û hogirên  
wî, di derheqê wî de tu rastî ji Edla û zîlamê wê re  
negotin. Ne ji mirina wî, ne ji saxiya wî tu agahî nîn  
bû. De werin debar bikin; ne rojek ne didu ne deh,  
ne hezar, ne çend sal; sêzdeh sal ... Ew dayîka ku ji  
bo wî xwên şevan li xwe diheramd, ew ji xwe re  
weke ewlekarî, sitarî û hêviyê didît, ji bo çêbûna wî

li şêx, mişayîx û ziyaretan digeriya, nivişt û himayîl  
çêdikirin, dua û fatîhe û yasîn didane xwendin ev  
sêzdeh salin nizane Bariyê wê saxe, miriyê, kuştiye  
an girtiye. Edla nizane gelo dê çi bike şîn, girîn,  
hewar an gilî biki. Ne kesek heye li halê wê bipirse,  
diber dilê wê bide, ne kes heye li gilî û gazincên ê  
gohdarî bike. Lê birîna Edla kur bû; ne dikarî şîne  
dîne, der û cîrana bicivêne, fatîhe bide xwendin û  
bibêje “rihma Xwedê lê be emê tev bimrin” ne jî  
dibû ku bêje Bariyê min li filan weletî, li filan  
deverê ye. Bariyê Edla bûbû perçeyek ji jiyana wê,  
bi şev di xewnên wê de bi rojê jî di xeyalên wê de  
bû. Her şevê ew li welatekî didît, li bajarek didît,  
li ber çiyayekî, li ber zinarekî didît. Der û cîrana li  
ber dilê wê didan, digotin “dilê xwe fireh bike kengî  
be dê derê” Lê ne derket, ne jî xeberek jê derket. Ji  
ber ku sal û dem derbas bûn, Edla û zilamê xwe  
hêdî, hêdî xwe hewisandin tunebûna Bariyê xwe.  
Madem ku jiyan berdewame emê xwe bi hewisênin  
tunebuna Barî, qene em zarokên xweyî hunda nekin.  
Lê ma dilê felekê bi kê dişewite, heta niha bi kê re  
heq û huquqî kiriye. Got hun bisekinin, a herî xerab  
di pey de ye. Hewar Xwedêyo hîna me tiştêk ji Barî  
fêm nekir, ji nişka ve Eshat (kurê biçûk) jî ji ber  
çavên wê hunda bû. De werin vî dilê teres bibînin,  
vê kura dadayî bibînin, de werin pizotê agir li ser  
birîna cedewî bibînin ... Na wele tiştêk nikare vê êş û  
elema dilê Edla bîne ziman, tiştêk nikarê salixê vî



dilê perpitî bide. Hunê bibjin gelo Edla dîn û har nebû bi çola neket? Na ! bi çola neket. Bû reben û pepûk deng his jê bihirîn, ro bi ro tefiya weke gula bê av bimîne, di halê xwe e çilmisî. Heta çendekî bi ser heşê xwe nehat weke gej û wexmiya dinewirand. Lê piştî demekê dîsa dest bi wead, yasîn û qurbana kir. Ji xwe tiştêkî dîtir jî di destan de nema bû. Piştî şeş – heft mehan Xwedê deriyek xêrê vekir û Esadê wê hate mal. Belê Edla eşeda xwe anî û got “hemd û sena ji navê tere Xwedayo, te ev roj jî nîşî min da, ma gelo heye ku ez qenciya te ji bîr bikim.” Belê demeke nu di jiyana Edla de dest pêkiribû, weke ku nu dest bi jiyane bike. Çiqas bariyê wê ne hatibe dîtir jî dîsa kefxweş û şad bû. Car caran keserên kur jî dikşandin lê ne tanî ser xwe, digot lê ku ev (Esad) jî nehata minê çi bikirana. Û şikrê Xwedê dikir.

Lê dilşadiya Edla pir ne ajot, sê – Çar meh şunde îcar Esad kete zindanê. Gelo nifir lê bûne ma ku rojê xweyî xweş bibîne dê kevir dêran bikevin?” Edla reben îcar bû rêvî û dergevanê zindanan. Lewre Esadê wî duwanzdeh Sal ceza girtibû. Divêt heft Sal û tiştêkî razê Di van heft salan de Edla li ber pir deriyê girtîgehên Tirkiyê geriya. Zindanên bi nav û deng, zindana Amed ê, duvre jî Eskîşehîr, Aydîn û çend bajarên dîtir. Dem jî gelek diware, her roj çalekiyeke girtiyan, her roj greweke biçîbûne. Edla rojê carekê ji Xwedayê xwe bergorî dibe û dibêje

Xwedêyo ma ev çiyê te anî srê min pîrejinê, min bê qiramê, darê şikestî. Lê dîsa jî li xwe vedgeriya û zindanî ji hundabûnê çêtire an jî hundabûn ji zindanê xerab tire, bera ne hunda û mirîbin bera di zindana bin lê ka Bariyê min xwezka ew jî weke Esad di zindanê de buna ... ji xwe Xwedê serê min kiriye serê şeq û deqa. ji teşqele û derd û kulan xelas nabe. Weke ku me gotibû dawiya emrê mirov bi xêr be. Edla heft Sal û çend mehên xwe li ber derî û dergehên girtîgehan qedand, geriya li pir bajar û şaristanên Tirkî geriya, hemu naskirin qul bi qul zindan bi zindan, kîjan li kure, çend mirov tê dene, cîhê çandan lê heye, kîjan zindan xerab tire, mudurên kîjan zindanan pir zikreşin û hwd. Feylezof dibêjin jiyan pir bê ujdane, ku fersedê bibîne serî ji mirov distîne û mirov li ser piştê li erdê dixê. Lê na ... Vaye li vir jiyan li Edla tê rihmê, piştî heftsal û çend mehan, felekê dîsa hate însafê û rasta xwe gerand gerand, dinya bû sayî, ji dora Edla bîna gul û kulîlkan tê. Esadê wê azad e û li cem wêye, serê xwe dêtîne ser çongên wê, di nav nivîn û lihêfên wê de radizê, Edla çeleng ji Esadê xwe re şîv û taştêyan çêdike, serê wî dişo, piştî di firkîne. Gelo ev xewn in an xeyal in na, na ne xewn in ne jî xeyal in jiyan rastiye. Belê hîna tu xeber ji Barî'yê wê nîn e. Lê bera be raziye, bêtira bêtirê jî heye ma Esad jî hunda bimana an ji heps û zindana derneketana meyê çî bikirana.

Xewn û xeyalên Edla dîsa guherîne. Dibê gelo ez xewnan dibîbnim an ev jiyana rastiye, quncirîskan bi canê xwe dike, ger ku xewn be şiyar bibim. Dîsa li xwe vedigere dibê na dayê na wele ne xewne, min heft salan kişand û bese jî. Dîsa hêdî hêdî ronkayî dikete çavên Edla. Çiqas pişt lê xwar bûbe, guh lê giran ji bûbin.

Derd û hesreta Barî ji dilê Edla dernayê, lê dîsa rukê we geşe hêviya wê bilinde, dem û dewranên berê têne bîra wê. Êdî hinek peyam jî bi Edla re çêbûye. Xelk û alem qedr û rumeteke zêde didin lawê wê, Esad. Bi rastî rewşa Esad jî pir baş bûye; ew Esadê ku zarok bû, naşî bû, tişteke ji hev dernedxist, nizanibû ro di kur dertê, di kur re diçe ava, pir caran dilê bav û dayîka xwe dihişt, vaye buyê zilam û pir bi qedr û rumet buye, rumetê dide dayîka xwe, dide bavê xwe, xelk jî êdî wan bi dayîk û bavê Esad nas dikin. Tişteke dîtir jî Esad bubû xwedî kar Meslekê jî; bûbû rojnamevan, weke rojnavanekî dehsale her roj dest tavête pirsgirêkekê û her roj nuçeyeke wiyî dirêj di rojnamê de derdiket. Esad rojnamevanekî mixalifî sîstemêye û her roj bê tirs û xof kêmanî, xeletî û bêbexteyên sîstemê di nuçeyên xwe de têne ziman. Bi vê sedemê gelê bajêr zu Esad naskir û hezkirina xweyî zêde nîşî wî dide. Vê rewşa Esad dilê Edulê (bi tirs be jî) hîna jî xweş dikir. Ma ji vê çi xweştir e ku zarokên mirov ji mirov mezintir û bi rumettir bibin. Xelk û alem mirov bi zarokên mirov

nas bikin, li malên xwe basa başî û zîrekiya zarokên mirov bikin!

Vê carê dilşadiya Edulê hinek zêde domand. Êdî teprepka ser dilê wê jî hindik bûbû. Ji ber serbilindiya kurê wê Esad gelek pîrejinan xweziya zwe bi halê wê tanîn. Lê feleka malxerab, zikreş û xêrnexawaza a xwe kiribûn yek, teva bi hev re soz peyman xwaribûn divêt kêfa Edulê lê bi şiriqê, divêt dîsa girî û hewar bibe para wê. Û rojek ji rojên Hezîranê nokerekî xwe şandin kuçeya ezîzoxlu. Heta xebera nexêrê giheşte dayîka derd û kula Esad ji xeberdan jî ketibû. Civandina hemu doxtor û hekîmên fakulta Dicleyê jî nebû çareseriyê birîna Esad.

We go îcar bi pîra Edul çi bû? Ma dê hîna çi pê bibe ... Ne cihê derban tê de ma ku felek lêde ne jî roja wê dibiriqê ku noker jê bitirsîn, her kesî bela xwe jê vekiriye Di serî de dost heval û hogiran ew bi tenê nehiştin, di ber dilê wê dan, bi derd û kulên wê re bûne şîrîk. Lê îroj dost û hevalan jî ew ji bîr kirine, ne tê bîra kesî ne jî xeyala wan. Wê xwe xistiye mezelekî bi derî ji sibehê heta êvarî wêneyên dixunê û rojan dihejmêre .

25.11.2000

Xezoka Sofî Misto

Qedrî Dêrsilavî

Rojek ji rojên havînê ye. Amed germ e, dikele, hêk li erdê dibiriye. Zarok û pîrekan xwe dane ber siyên

dîwaran, dikandar û penêfiroşan jî kursiyên torlu danîne kêlekên deriyên dikanên xwe û li ber siyê qorzîkan nitirandine. Texsiyeke Ford Tanus bi cada Mêrg Ahmedê (Melîk Ahmed) de berjêr dibe, berê xwe daye Xana Delîla, (otêl saraya karwan a, mezin). Sê zilam û jinek di texsiyê dene.

Ajo (şofêr) ê çîçelaskî û zilamekî bejindirêj, çavbelloq ku berçavkek reş li ber çave, li pêşiyê ne û zilamekî qelew zikberoş ku qozîkên işlikê wî ji bin pontlon revîne, qayîşeke çeprast di ser herdû milên xwe re bi piziya (çihê doxîna) pontlonê xwe ve zeliqandiye û jinikekê li kursiyê paşiya texsiyê runiştin e. Navê wê jinikê Hezal Xoşses e. Jinik dengbêjêke bi nav û deng e. Ev çend sal in li metropolan, di salon û televizyonan de kilaman dibêje, pir meşur e. Her ro rojname û televizyon ji deng, awazên û xweşikiya wê bas dikin. Hezal hatiye Amedê ku çend rojan kilaman ji mêvanên otela Kerwan Sarayê re bêje, sebr û hedana wan bîne. Ji xeyrî ajo ew herdû zilam jî notirvanên (badigart) wê ne.

Hemu dikandarên Mêrg Ahmedê dev jî kar û bazara xwe berda ne, li xweşikî û bedewiya Hezal fericî ne. Bi rastî jî Hezal jineke bedew e.

Porekî zerî, zêrînî li ser e, çavên we weke du heyvên çardehşevî, fanosên têr don dibiriq in. Mijankên wêyî misasî, dev û lêvên wêyî lihev sor û sipî, weke bastêqê Zinarê ne, hinarokên ruwê we weke du

sêvên Malatî, tilî û pêçiyên wê weke mum û şima,  
spî û zirav in, poz û bêvila findiqî, çaplên wêyî rut û  
sipî weke stûnên konê erebî ne, sê bazinên yektêlî di  
zندان de dibiriqin. Eniyeke fireh û bi deq. Çav û  
biruhên kilkirî, qeytanî, qelem kirî, bi ser hinarokê  
ruwa de du biskên hine kirî dişildiqin. Pantilonekî  
Sifincê Emerîkî, lê şidiqiye û işlekekî hevrîşim ku  
serê pêserê wê weke heba nokê tere bel bû ne, lê ne.  
Berçavkeke rengînî gilover li ber çava ye.

Bi rastî jî Hezal li gorî nav û dengê xwe ye. Nav û  
dengê wê derketiye derveyê welat jî. Êdî kasetên  
Hezal ne li welat tenê, li welatên cîran jî, ji kasetên  
hunermedên wan zêde tir tene firotin. Hezal kilaman  
bi tirkî distirê, lê sewt û awazên wê awazên rojhilatê  
ne. Kurd û Ereb û Ecem (Fars) ji Tirkan zêde tir li  
Hezalê gohdarî dikin. Dengêkî zengilî, awazekî zelal  
û bêhneke dirêj li ser Hezalê ye.

Her roj bi sedan rojnamevan, telefizton û kovaran li  
du ne ku pêre hevdişînekê pêkbînin. Heta niha piran  
ji wan pêre hevpeyîvîn, roportaj û got û bêj kirine,  
pir tiştên girîng û sosret jê pirsîne, lê hîna jî kesî esl  
û fêslê Hezalê fam nekiriye. Hîna jî kes nizane  
Hezal kiye, keça kêye, ji kîjan bajarî ye. Deva deva  
tê gotin ku ew bi eslê xwe Kurd e, lê kesî bi esehî ev  
fêsih nekiye. Kê çi jê pirsîye, bi rastî û diristî bersîv  
daye, lê hîna kesî bersîva esl û fêslê wê, welatê wê jê  
ne girtiye. Her ku ev pirs hatine kirin Hezal ê gotin  
birî ye û gotebêj qut kiriye. Ji ber vê jî kes nizane ku

Hezal kiye, ji kure, bavê wê kiye, dayîka wê kiye.  
Wê jî tucaran ji dost û hevalên xwe re jî basa dayika  
xwe, bavê xwe nedikir.

Heta ku Hezal li ber derê otêla Kerwan Seraya  
mezin ji texsiyê peya bû û Silikê parsek ew dît ...  
Îcar em ji devê Silê Parsek esl û fêslê Hezal ê  
bibîzin. Silê Parsek dibêje

Ev Xezoka Misto ye, ez wê bi dê û bav nas dikim.  
Navê Xezalê bû, lê gundiya jê re digotin "Xezoka  
Misto" Em û ew ji heman gundî ne. Dema em li  
gundê Dêrtiyalê bûn, em û wan cînarê hev bûn. Bi  
destpêka şer re, çawîş, em ji gund deran in û gund  
şewitand. Ji naçarî ew jî weke me hatin vî bajarî, em  
li taxa fatîhê ketin xaniyekê xerabe, wan jî li Ben û  
Senê, axurekî ku zivistanê dewarên dermale  
dixistinê ji xwe bi sed hezarî kirê kirin, ketnê. Duvre  
em jî hatin cîrantiya wan.

Dema ku Misto hate bajêr, keça wî Xezokê şeş -  
heftsalî bû. Misto jî zilamekî feqîr û pir sofî bû.  
Nedhişt jina wî Gulê û keça wî Xezo derkevin ber  
derê kuçê jî. Heta sala wan zivirî bi çend quruşên ku  
ji gund bi xwe re anî bûn, debara xwe kirin. Lê piştî  
ku sal li wan zivirî, bi zorê xwe derxistin biharê.  
Misto nikaribû karekî bike û nedhişt Gulê û  
Xezokê jî derêne derve karekî bikin. Karê ku  
bikirina jî nîn bû, lê belkî ji xwe re biçûna pincar,  
tolik, bendik û kirşikan. Lê Misto ew jî ne dihişt.  
Silê parsek berdewam dike û wer dibêje.

Her sal di mehên Nîsan û Gulanê de keçikên taxê diçine bexçê Hewselê tuwên reş (ku ji wan dibên "Qara hibir") top dikin û tînin li sukê, ji xwe re difroşin. Pêşî çend caran cîranan û Gulê ji Misto re gotin; tu debara te nîn e, qene keçikê bişêne bexçe, belkî ji xwe re çend teyfik tu bifroşe û gezek nan ji were bêne, hun bi bê minetî bixwun. Lê Misto ketibû intê, digot : Ezê saxî ne mirî, keça min Xezo çewa here suk û kolan, tuwan bifroşe xelkê. Me teva digot : Kuro zarok e, tişt nabe û tu jî feqîrî, fitwa te heye, Xwedê li te nagre. Lê dîsa Misto ji a xwe ne dihate xwar û keçik nedîşande derve. Pir neçû Misto bi nexweşîneke xedar ket û naçar ma ku ji çûna Xezo re dengê xwe dernexe. Xezoka reben ne çîh zanibû ne durb, ewilê bi keçikên me û cîranan re çend caran çû, tu topkirin, bi hevalên xwe re xiste teyfika li Deriyê Çiyê firot. Ji ber ku Xezo bi ziman (Tirkî) nizani bû, di serî de ti tu jî nedifrotin. Lê Xezo bûbû weke çûka ku ji qefesê bi filite. Ro bi ro derdorên xwe nas dikirin. Di çend rojan de çend peyvên Tirkî hewisî û kuçe, kolanên Amedê nas kirin. Piştî çend rojan jî, Xezo êdî bi serê xwe diçû bexçe û rojê neh- deh teyfik tu di firotin.

Di wan rojên ku Xezo û keçikên taxê diçune tuwan rojekê Fexoyê Canbaz dengê wan kiri bû ku di rê de keçik ji xwe re kilaman dibêjin. Îcar Fxo li qawê ji me re got: Kuro çi dengê xweş û zelal li ser vê Xezoka Misto ye. De welle xweyê wê hebin dê ji



Meyrem Xan û Eyşe Şen ê jî bibuhure" em jî hînga pê kenîya bûn. Ez çî serê we bi êşênim; Xezo di mehekê de ji hemu heval û hogirên xwe zêde tir kir. Êdî bi tikî serê xwe diçû û dihat, d,çû heta Derê çiyê, Ofîs û pir cihên dîtir. Ji xwe Tirkî jî hewisî bû. Tiqe, tiqe cewaba xwe dida. Ku meha Hezîranê hat, tu qedîyan Xezoka me dest bi firotina ava sar, benîşt û selpakan kir. Pir neçû esnaf û dikandarên mêrg Ahmedê û Derê çiyê Deng û awazên Xezo jî hîn bûn. Îcar tev lê dicivîyan pere didanê û pê kilam didan gotin. Ji ber ku pere ji Misto re tanîn, ew xwedî dikir, Misto jî razî bû. Qederê Çar pênc mehan bi vî tewrî, Xezo bû bû gula suka Mêrg Ahmedê û derê çiyê. Tevên dikandaran ji Xezo hez dikirin, ku ne lazimbûna jî jê selpak dikirîn. Îcar wê Salê (Xwedê zane deh Sal heye) serê ziviztanê bû, medî rojekê Xezo ji holê hunda bû. Bavê Xezo Misto pir lê gerîya hemu kuçe û kolanên Amedê li hev xistin. Lê ew nedît. Serî li qerakol û dadgehan da. Lê wan jî Misto çend rojan girtin binçav, gotin keça te derketiye çiyê û tu hatiyî pirsê wê ji me dikî, di nava du rojan de, li kur dibe, divêt wê bînê an na ..... Piştî ku qerakolê Misto bera da, Misto nema wêribû ku bibêje keça wî hunda bû ye û lê jî bigere. Misto yê nexweşokî, Ji kerban re pir neajot mir. Gula reben jî hîngî giriya di du mehan de kor bû. Du sal neçû ew jî mir. Ji xwe kes û xweyên wan jî nîn bûn ku li Xezo bigere. Ê zûdeye Xezo jî Misto jî û

Gulê jî hatine ji bîr kirin. Ma kiyê feqîran bibîr  
bîne?....

23.09.2000

Mirina pitikekî

Recep Dildar

Sal 2001, demsal payiz e. Germ kêm bûye, kevirên  
reş yên Amedê êdî nasincirin. Hewa ne cemidî ye, lê  
dilopên baranê hûrik hûrik têne xwarê. Wextê nîvro,  
çûbûm malê. Dotmama min taştê amade dikir. Zila  
telefonê lêket min rakir, xwişka min a mezin bû. Bi  
dengek dilşewat digo: “brê min lawik dimire, em çî  
bikin.” Em li taxa Rezan rûdinîn. Ez û pîreka xwe li  
erebê suwar bûn, em çûn taxa Elîpaşayê. Mala wan  
li paş bedenê li hêla Benûsenê bû. Em di qulikek  
bedenê re derbasî hêla din bûn. Xanî tev li ser hevin.  
Xanîyên mecbûrîyetîyê, xanîyên xizanîyê...

Gava em ketin hundurê malê, qûrîn bi wan ket.

Xwişk, xaltî û meta pitik, tevî diya wî tevde bi ser  
hevde digirîyan. Pitik torinê xwişka min e. Yek salî  
bû. Nexweşîya wî lê kevn bibû. Çend caran biribûn  
bijîşkan lê feyde nedîti bû. Ji tunebûnê nikaribûn baş  
li pitik binerin, gelek caran tedavîyên wî nîvce  
diman. Xêncî wî çar zarokên din hene, ev yê biçûk e.  
Bav ne li male, ji bo xebatê çûye Stenbolê. Lê belê,  
nikare zêde peran ji wan re bişîne.

Piştî me, kalê wî jî hat. Ap û xalên pitik jî, wekî bavê  
wî ji bo kar û xebatê çûne bajarên dûr. Gava mirov  
feqîr be, yekcarî bêkes dimîne. Kalê pitik ba du heb

cîranê xwe kir, qazme û bêrek girtin û ji bo mezal bikolin berê xwe dan Goristana Derê Mêrdîn. Goristan ji mala wan ne pir dûr e, herî zêde peyatî deh deqe dajo.

Ji bo pitik defin bikin, hewce ye ku bijîşk rapor bidin. Ez rabûm, çûm navenda tendurîstîyê (sağlık ocağı) ya ku taxa wan pêve girêdayî ye. Bijîşk nas derket, navê wê Zelal bû, li civatekî de me hevdû naskiribû. Ew jî pir li ber pitik ket, hevalekî xwe şand em çûn malê li pitik mêzekir dawîyê jî rapora xwe nivîsîn. Piştî raporê ez û kalê pitik çûn Sûka Mêrgehmedê me ji bo kefen padisqe send. Pîrika wî li malê av germ kiribû.

Ji bo pitik bişon, kal û cîranek xwe çûn li melle bigerin. Lê, melle peyda nabin derin cem kîja wekî din karê wan heye. Melle, xizanîya kalê pitik dibînin û fam dikin ku zêde nan têde tune ye. Ji ber vî yekê naxwazin werin. Lê dîsa jî aqil dane kalê wi, jê re gotine “yekê desmêja pitik jê naşikê kare wî bişo.” Lê belê kesê dil nedikir, digotin “em nikarin gunehê pitik têxin situyê xwe.” Min go “ezê bişom.” Min mêzekir bê dilê xwişka min e. Zanibû ku ez nimêj nakim. Dawîyê kalê wî desmêj girt û bi ava germ û sabûnê wî temîz şuşt. Kal piştî şuştuna xwe qedand, çav tije hêsir bûn, li kêlekekî runişt û hêdî hêdî qûrîya.

Pîra pitik xawlîyek hanî, min pitik pê zuwa kir û bi se qat kefen pêça. Kal pitik xist hemêza xwe û me

berê xwe da Goristana Derê Mêrdîn. Gava em ji derê hewşê derketin dîsa qûrîn bi pîrekan ket û bû "hawar hawar" a wan. Ji bo Ferat'ê xwe dikirin hawar, ji bo xizanîya xwe dikirin hawar, ji bo bêkesîya xwe dikirin hawar...

Li goristanê mezal amade bû. Ji xwe mezelekî biçûk bû. Hundurê mezal ji nû de di destre derbas kirin. Pitik têda bi cîh kirin û hêdî hêdî me axê havêt ser wî. Axa ji me re ne bû yar, di mirinê de ji me re sitarî dikir. Wekî pitikên dinê, yên ku ji xizanî û bêkesîyê dimirin, me Firat ji bi axê veşart, ji xwe xêncî axê tu tiştêkî nikare xizanîya me veşêre.

#### KÎLOYÊN OSMÊN

Bûbê Eser: bube@telia.com

Osman kurê malê yê mezin bû, loma ew di nozdeh saliya xwe de hatibû zewicandin. Dema temenê wî dibe bîst, ew dihare leşkeriyê. Leşkeriya wê demê jî gelekî zor bû. Eger meriv ne xwenda ba, ew leşkerî li mirov dibû zîndan, dibû cihê tehzîp û îşkenceyan. Lê çî dibe bila bibe, dijmin di serê gelek kesan de bi cih kiribû ku: "Ew kesên leşkeriya xwe nekiribin, ne zilamin", "Leşkeri dehynekî welêt e, divê ew bê dayîn" Dema dehynekî Osmên jî hatibû, wî jî, ji bona ku bibe zilam berê xwe berbi xerîbiyê vekiribû. Ji dê û bavê xwe û ji şêrîna ber dilê xwe dûr diket.

Piştî çend mehên Osmên li leşkeriyê qediyabû ku rojek ji rojan pîreka wî dinêre ku vava Osmanê wê di rê de ye û berbi mal ve tê. Berê ew ji çavên xwe

bawer nake, loma hinekî çavên xwe bi bişta destê xwe yê rastê tev dide, dinêre ku bi rastî jî ew e. Ew jî ber bi wî de dibeze, xêrhatinê lê dike û dibêje:

- Osman ma te leşkeriya xwe qedend?

- Keçê qedandina çi halê çi! çar sal wê çawa biqede, ez jî nizanîm.

- Lê ev hatina te ji bona çi ye? Xêr e, inşale.

- Keçe hela bes bireye, em xwe bighêjin mal dûre ez ê ji te re bêjim.

Pîreka wî çentê di destê zîlamê xwe yê leşker de bû girt. Hatin mal, hetanî wan xwe gîhandin mal, çend gundî yên din jî, dît ku Osman ji leşkeriyê vejeriya ye.

Dem dema êvarî bû, piştî şîvxwarinê adet bû, gundî biçûyana xêrhatina kesên ku diçûn xerîbiyê an jî jê vedigeriyan. Ji ber ku Osman jî ji leşkeriyê vejeriyabû, divyabû êvarî gundî biçûyina mala wî xêr hatin li bikirina, hal û hewalê wî bipirsiyana.

Gundiyan weha zû leşkerî qedandina Osmên meraq kiribûn loma wan ê ji wî bipirsiyana ku ew wî çawa weha bi çend mehekî leşkerî qedandibû. Loma êvarî odeya Osmên geriya, kesên bihîstin, hatin mala wî.

Piştî qedandina xêrhatinê û vexwarina çayê, ji rîsipyên gund xalê Xelo ji Osmên pirsî:

- Wa Osman, tiştê ku ez dizanim, leşkerî çar sal in.

Lê ez bala xwe didimê ku ancax çar mehên te qediyên, ku tu hate mal, xêr e gelo?

- Xalo bi xwedê kîloyên min li gor wezna leşkeriyê

derneketin, loma serbaz ez şandim mal ku hinekî kîlo bigrim. Ez ê piştî sê mehên din dîsa li leşkeriya xwe vegerim.

- Ha, got xalê Xelo, serê xwe weke alimekî hejand û domand.

Em jî tirsiyan, me got dive...

Hîn xalê Xelo axaftina xwe neqedan, hema apê Kirkirkê got.

- Tu çima nabê ji niha û pêve em xortên xwe temî bikin ku berî çûyina xwe ya leşkriyê bila xwe zeîf bikin, da ku ew jî weke te zû werin mal.

Kirkirkê ixtiyarekî gundiyan bû. Leqaba wî Kirkirkê bû, ev nav an jî ev leqab ji ku girtûbû qet nehat fêmkirin. Ev nav an jî ev leqad bû bû navekî wan î malbatî. Navê wî Ehmo bû. Li êdî ew bi mala Kirkirkê dihatin nasîn. Xalê Kirkirkê, mirovekî xweşbêj, henekçi û nefsbîçûk bû. Wî gelek caran bi henekên xwe, gotinên dilê xwe yên hişk, li noqa hinê ku wî ji wan heznedikir, dixist.

Şêx Mehemedê, kurê sêx Deman, bi nav û dengê xwe şêxekî şêxan, lê bi emelên xwe ne tu tişteki bû, ji derî kete hundir, hemî gundî ji ber rabûn, ew çû ba Osmên destê xwe dirêj kir û got:

- Tu bi xêr hatî Osman! Çima te weha zû leşkeriya xwe qedand? Gelo dema leşkeriyê kurt bû ye? Ê haya me jê tune ye.

Osmên destê şêxê xwe maç kir, berê şêx dûre hemî gundî runiştin. Dema Osmên jî xwe li ser kulavê bi

rengîn da erdê û got:

- Na, şêxê min na! Leşkeri weke berê ye, yanî hîn jî çar sal in.

Şêx Mehemed li dora xwe nerî, serê xwe hejand û got:

- Lê te çima weha zû qedand?

- Şêxê min, min zû neqedandiye. Ji ber ku kîloyên min kêmbûn, wan ez şandim mal ku kîloyên xwe temam bikim û ez ê dîsa herim.

- Ha, ev mesele, got, şêx Mehemed. Ji nûve bi awayekî rehet xwe li ser kulavê xwe ediland, milê xwe yê rastê sipart balîfa (balgî) kêlekê û dest bi şîretan kir...

Piştî belavbûna gundiyan, ji nû ve Osman rewşa hatina xwe ji pîreka xwe re jî rava kir û razan.

Piştî sê mehan Osman li leşkeriya xwe vegeriya.

Roja ku wî xwe gîhand cihê xwe, Serbaz ku ew ji bona çend kîloyan bigre şandibû mal, ew wezinand, dît ku kîloyên wî weke yê berê ne. Çend mehên din temam bû bû ku serbaz rojekê banî Osmên kir û ew dîsa wezinand ku kîloyên wî hîn jî weke yê berê ne, ne kêmbûn û zêde kiriye. Serbaz ji vê rewşê şaş mabû û biryar girt ku dîsa Osmên bişîne mal da ku ew hinek kîlo bigre.

Piştî çend mehekî Serbaz dîsa Osman şande mal.

Osman çar mehên din li mal ma û vegeriya leşkeriya xwe. Vê carê kêfa serbaz hatibû ku Osmên hin kîlo girtine. Banî wî kir û bir cihê weznê. Çi mixabin ku

wî ne kê m û ne jî zêde kiribû. Kîloyên wî weke yê berê bû. Loma serbaz îcar hinekî aciz bû, kire niçe niçe û jê re got:

- Hey, xwe nenas ez te dişînim mal ku tu hin kîlo bigre û vegere. Lê ev du carin tu dihare, rehetiya xwe digire, xwarina xwe dixwe. Lêdanê jî naxwe, lê çima tu kîlo nagre.

Vê carê Osman hinekî tirsîya bû ku serbaz li wî bide, loma wî bi awayekî tirsok got:

- Ma çi dizanim, qomandarê min.

Serbaz ji halê Osmên şaş û matel mabû, wî jî nema dizani bû ku çi bike. Li leşkeriyê pêwîst bû ku kîloyên mirov li gor pîvana hatibû dayîn ba, Ji bona kîlogirtinê serbaz du caran Osman şandibû mal, ev jî mesrefek bi serê xwe bû. Da û stand, çend rojekî fikirî û dîsa şande du Osmên. Osman hate silavek baş ya leşkerî da û got.

- Emir bike qomandarê min, we şandibû pey min.

- Belê, belê. Ka were em bi hev re herin aşxanê temiya te bidim wan ku ew te hinekî qelew bikin, da ku tu leşkeriya xwe biqedîne. Bi vî halî tê bibe belaya serê me.

Serbaz li pêş û li dû jî Osman ketin hundir aşxaneyê leşkeriyê. Kesên hundir ji ber wan rabûn. Serbaz gazî kir û got:

- Bila berpîrsê aşxaneyê were vir. Bi bazdan kesek ji nav koma kesên ku xwarin çêdikin berbi wî hat, qomûta xwe da û got:



- Emir bike, qomandarê min.

- Binêre, vî mirovê bi min re, baş nas bike. Ez ê wî du mehan teslîmî te bikim. Tê rojê sê caran, çî xwarina xweş ku wî xwest, tê jê re çêke.

- Tu emir bike, qomandar! Ma ev jî tiştêk e. Serbaz îcar li Osmên nerî, kenîya weke bêje "bê îcar tu kîloyan digre an na" û bi dengekî berz got:

- Binêre Osman tê du mehan li vir bixwe, vexwe û dilê te çû çî tê ji wan re bêje. Tu çî bixwaze wê ji bona te bê çêkirin. Ji niha û pêde tu yê nobedariyê jî negire. Piştî çend mehekî em ê li halê te binêrin, bê kîlo girtin çawa dibe.

Niha kêf bû bû kêfa Osmên. Li vê leşkeriya zor, ji bona wî ne nobedarî û ne jî lêdan hebû. Berovajî wê, serbaz ew danî bû ba aşxanê û dilê wî çî bixwesta wan jê re çidikirin. Du mehên Osman bi vê kêf û rehetiyê qedîyan. Dûre serbaz şande dû wî. Ew hat, serbaz li halî wî pirsî got:

- Îcar tu çawa yî Osman, te kîlo girt an na? Em ê niha fêhm bikin. Bi dû min de, em ê herin te biwezinîn in. Serbaz bi kêf da pêşîya Osmên û çûne cihê wezinandinê. Serbaz gazi kir û got:

- De, here ser mêzînê em binerin bê îcar tu çend kîlo ye. Osman qet tiştêk negot, sola xwe derxist û hêdî nigên xwe dan ser mêzînî. Lê çî mixabin ku mîla mêzînî, kîloyên Osmên weke yên berê nîşan da. Dema serbaz çav li kîloyên wî ket hêrs bû. Bi qêrîn ji Osmên re got:

- Peya be! û bi dengekî berztir axaftina xwe domand.
- Diya te heye?
- Na! qomandarê min.
- Bavê te heye?
- Na qomandarê min.
- Ma tu çima nebê ku ew ji derdê te mirin in.

## GUNDÊ TEZE

### C. Gênc

Bihar bû, heyemê derketinê. Çayir, çîman, deşt û zozan xemilbûn bi gul, sosin û rîhana. Belekiyên berfê diheliyan, dixulxulîn avên kanîya yê sar, berjêr dibezîn, dihatin jêr, tev hev dibûn, çem girêdidan û dikişîyan berbi deştê û diha dûr.

Reşhêla çivîkan kilama hercarî distira. Li ezmanê sayî nola tasqîna refê qulîngan dihat. Keriye şivanan xwe dabû quntara çiya, çotkaran ho dikir ber serê zeviya, şov radikir in.

Qîz û bûkên gund cêr li ser mila berbi kaniya nû dimeşîyan, milê xwe li milê hev dixistin, dimilmilîn û dikenîyan, hinek ji ser kanîyê vedigerîyan, dilezandin, digihîştin mal.

Jinêd serê dew dikilan, li hewşê fire gore çê dikirin, teşî diristin. Li ber derîkî çend mêra hostatî dikir, hacetên şikestî çê dikirin, yê nûh çê dikir in. Gund da hewarze bû, xevat dikelîya, kesî bê xevat tunebû. Biniya gundda hewarze bû, li wê derê bû mekteba teze -dibîstana nû - koşka belek. Ewê li xwe hêwirandibû ji sedî zêde qîz û kur, kulîlkê teze. Bû

şingîna zengilê, car din bû hwarze, vebû deriyê  
xwendinxanekî nû li wê derê, jinan dixwend bi fikra  
nûjen.

\* \* \*

Li bêderê, biniya mala, kom bi kom berx diçeriyên,  
çindik - çindik direqisiyan vî alî, wî alî direvîyan  
berxên delal, karên soro. Dilê min hejiya, tev lerizî,  
min bîr anî berxvantîya xwe, berjêr livîm ber bi  
berxa bê hemdî xwe.

? Bereket be, apê kal. Min silav lê kir.

? Bi xêr hatî, xortê delal. Silava min vegirt.

? Çi hewale, berxvan tuyî, ne kurê te. Kalo kenîya bi  
dilê guleş, deqekê kerr bû, serî hejand, qelin geş kir,  
du hecam kir.

? Belê berxvan ez im, şivan jî ez, roja min wa hat,  
wê wa jî here. Xwezî li we, bi xwendina we, ulmê  
we.

Car din bû şingîna zengilê. Berx vecêniqîn, si tuyê  
hevra çûn, berjêr revîn, tev hevdu bûn. Kalo ez  
hêştîm, berjêr lingirî.

Roj hatibû nîvro, kal û pîra hila berx vediqetandin,  
berxa ew kilikî kiribûn. Zeyara dixwend. Lê koma  
jina zû bela bûbû, wana dixwend du saeta, sibê zû,  
duda êvarê.

Kevanîya tivdarekê firavîna pala dikir. \*ivana pezê  
nîvro berbi mal dibir. Cotkara hela radikir, diçûn wî  
seriyê zeviyê, vedigeriyên serê din. Siyarekî jêla  
dilezand. Ber derê mektebê tijî bûn.

?hevalê Rostem, hevalê Rostem... - bû hewarza çar alî. - Rostem ajot ber derê mektebê, silav li wan kir, bexçekî tev pêçayî ji sedî zêde rojnama " Riya Teze" (\*2) dirêjî derskomê kir û vegeerîya nav gund. Min derheqê Rostem de gelek tişt bihîstibû, lê min ew nedîbû.

Min derî kuta, ez çûm hundur, silav lê kir, bi serê xwe silava min vegirt, kaxez ji dest min girt, lê nihêrî û destxweda got : Alo, alo Musa tuyî, ez hema hêja ji nehiyê hatim, min dixwest elametî bida we, wekî nehî razîye ji gilîyê te. Êvarê civate, hatina te ferz e. Pak, ez hêvîya te me, zû wer e. Trûbkê danî, ber bi min vegeerîya, - tu çima usa xirab sekinîyî, keremke rûnî!

Min hela duh bihîstibû hatina te, pake me hev dî. -Razîme,- min wekiland û ez rûniştim himberî wî. Rostemî bedew bû, zerînî bejin bilind, gul û nûr ji sifet dibarî. Ew mijûl bû bi kaxezekî destnivîsar va. Deqekê sifate bedew bû terî, ji hêrsa kaxez qat kir, kire dexla xwe.

? Çetîn e, çetîn, şêxa û kuleka, îlakî jinê wan, mecala me birîye. Nizam emê çi çax bikaribin koka wan bibirin.

? Tu çiqasî jî hişyar bî, seypîsanê kuleka, şêxa û mella dîsa hişyar in.

? Çi behse hevalê Rostem? Min jê pirsî.

? Pêla han min ji lawikê me Batimêra nivîsî bû, wekî bêne gund, em artêla xwelîyê teşkîl dikin, têla

kuleka berî min gihûştiye wan, li hev danîne, wekî kî  
bibe artêl, ew dibe kazonî, keda wan ji sê par  
hukumetêra nin, paşê parek ya wan, avayê teze jî bi  
kirêye. Serê malê jî gerek 1000 manatî next bide, lo  
çi bêjî li hev danîne. Hevala wê derecêda nivîsîbû,  
ew kaxezê min dixwend, nameya wan bû, nivîsîbûn,  
raste giliyê usa? Gavê bi de, dinivîsin, lê hema emê  
bên, halê me ne tu hale, piştta me bin palanada rizîye,  
wekî din silav şiyandine.

Agirê dilê Rostem gurr bû, ew diqecqicî kolxozê  
çêke. Rostem dît kolxozên gundê cînar, yek salek,  
du sal pêşda teşkîl bûbûn, ji kasibîyê tişt tune, îro ew  
xweyê hebûnêne, bi tîfaqa qewîn.

\* \* \*

Roj hêdî hêdî ava bû. Zeraya penc kuta bû. Serê çiya  
hindik hindik diqulibî, ji ciyê dûr cotkar ber bi mal  
dilivîyan. Ga westiya bûn. Nexira dewêr jî hilşiya  
nava gund.

Nîv saet nekişand, gund sî teqirî. Em nûh çûbûn  
hundir, me qewetî dikir. Bû çirîna derî. Musa derî  
vekir, silav li me kir, ewî jî bi mera dest bi şivê kir.  
Çend deqe şûnda deng li me kirin, wekî civat hazir  
e-amade ye-. Em ber bi civatê çûn. Tarî ketibû erdê.  
Seqaqe mezin kom bi kom bû bi jin û mêran.  
Rostem derê civatê vekir, seba bijartinê sedr teweqe  
kir. Civatê sedr bijart Caskê Hese - şivanê kevinewî  
gilî da hevalê Rostem. Giliyê rojê yek bû,  
derheqa kolxozê, kara wan.

Rostem dest bi xeberdana xwe kir, ewî bîr anî halê gund, koçeriya wan, hezar, hezar salî pêşiya wan, paşê jî ew li serê çiya bûn bê sitar û bê pergala, di zulmêda bûn qetla har. Paşê vegeriya, ez zêde xeber nedim, hûn pak zanin, wekî kî bûn dijminê me, gelek biryan, lê dîsa hene li doranê me, di teribînin xebata me. Heta par jî hûn koçer bûn, li serê çiya. Rostem xeber dida bi fesal û sar, bi awakî bê hêrsdarî vegeriya ser giliyê xwe.

Nîşan da destanînên welatê me, bajarê sar, hebûna zor, xemla wê bi maşîn û traktor, bi dem û dezgê nûh serbest û mor. Civate kerr bû, guhdarî dikir, xeberdana Rostem li gelek xweş hat. Li wêderê bûn casûsê pîr Batînê Evdê kulek. Wana bi çavê xwe xeber dida.

Hindik, hindik sera vala bû. Rostem xeberdana xwe kuta kir bi vî giliyê han.

? Gundîyên Serê, emrî pêşe, em jê şûnda, mêze kin li gundiyê cînarê me, wext derbaz nekin, werin em kolxozê çêkin, ev e riya me bi gilîyê Lenîn.

Paşê xeber da Sasûna pîr û Musa.

\* \* \*

Wê êvarê ji 20 malî kolxoz çê bû, bi eşq û şayî, li gundê Serê. Ewan qetand zincîrên tunebûnê, bûn hevalê tîfaqa mala mezin.

Wê şevê heta sibê pîr Batînê, kulek Heso û şêx Erebranezan bi dilê birîn.

Sibê ron bû, tav zeriqî, pence kuta nav Sera çiya.

Gul û sosin vebûn, kenyan. Sefer rabû, bû şerê giran,  
li hemberî hev sekinîn du sinif, yek xedar bû. Ew  
sinifa kulek bû.

C. GÊNCO

Ji Pirtûka "Nivîskarên Kurmanca"

Efrandina duda. Rewan -1934.

\*\*

## PEYAMBER

Wergêr: Husein Muhammed

Weşanên Taybet ên Kovara Mehname: 11

Sal 2002

Copyright © wergêr & Kovara Mehname

Xelîl Cibran

(6.1.1883 - 10.4.1931)

Xelîl Cibran li nav darên selwiyê li Bişarêya Libnanê hat dinyayê. Wî li wir  
dest bi

xwendekariya xwe kir lê di 12-saliya xwe de - sala 1895an - koçî Bostona  
Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kir.

Di 14-saliya xwe de ew bi tenê vegeerî Libnanê daku xwendekariya xwe li  
Medreset el-Hikmetê kuta bike. Li wir zimanê spehî yê helbestên wî, ku  
tê de

çanda erebî û bandora rojavayî digihin hev, teşe da. Wî du caran li Parîsê  
nîgarkêşî xwend, dû re vegeerî Bostonê û paşî çû New Yorkê û ta mirina  
xwe li wir

ma.

Li dema jîna xwe ew herî zêde wek nîgarkêşek portreyan dihat nasîn û  
ecibandin

û gelek pêşangeh ji bo nîgarên wî li çar hêlên cîhanê hatine lidarxistin.  
Cibran

herwiha gelek ji pirtûkên xwe yê helbestane bi nîgarên xwe neqîşandine.

Peyamber (The Prophet), ku niha em bi kurdî pêşkêşî we dikin, naskirîtirîn  
û

hezkirîtirîn berhema Xelîl Cibran e û dikare wek stûn an jî bingeha  
nivîskariya wî

bê hesabandin. Ew yekem car di sala 1923yan de bi îngilîzî derket û piştî  
derketinê

di demek kurt de nav û deng da û hat hezkirin. Ta niha ew bûye malê bi  
qasî 30

zimanan. Bexçeyê Peyamber (The Garden of the Prophet) jî dikare wek  
dewama

Peyamber bê hesabandin lê ew bi xwe jî berhemek serbixwe ye.

Ta niha, ji bilî Peyamber û Bexçeyê Peyamber, herwiha romana Xelîl  
Cibran a bi

navê Baskên Şkestî jî li kurdî hatiye wergerandin (wergêr: Husein  
Muhammed,

Weşanên Helwest, 2001).

Di sala 1931an de Xelîl Cibran koça dawîn kir û ji nav me bar kir lê em  
dikarin bi

van gotinên ji Peyamber bangî wî helbestvan û fîlozofê bêpayan bikin:

"...Niha keştiya te hatiye û divê tu biçî. Bêriya te ya ji bo welatê bîranînên  
te û

warê mezintirîn hêviyên te gelekî kûr e; û evîna me nikare te li vir bigire  
û jana



me jî nikare te berbend bike. Lê em hêvî dikin ku, ji berî ku tu ji vir biçî, ji me re

bipeyive û me ji hinek rastiya xwe hevpar bike. Em ê wê rastiye bidin zarrên xwe

û ew ê jî bidin zarokên xwe û bi vî awayî rastî dê ti caran ji bîr nebe..."

Husein Muhammed

Peyamber

Xelîl Cibran

Wergerandin ji çapa îngilîzî "The Prophet": Husein Muhammed

Almustafa, yê bijartî û hezkirî, yê di rojên xwe de berbanga gelê xwe, duwanzdeh salan li bajarê Orfaleseyê li benda keştiya xwe mabû, li benda wê

keştiyê ya ku diviyabû vebigeriya û ew bi xwe re bigihanda girava lêbûna wî. Û

di sala duwanzdehan de, li roja heftem ji îlonê ango meha rezçinînê, ew hilket

ser zinarek li derveyê dîwarên bajar û li deryayê nerî; û wî dît ku keştiya wî ji

nav mijê dixwiye. Hingê deriyên dilê wî vebûn û dilşadiya wî dût li raserî deryayê fire firî. Û wî çavên xwe girtin û di bêdengiya giyanê xwe de lava û dua

kirin.

Lê dema ew ji zinar daket, dîsan xemgînî ket dilê wî; û ew ji xwe re ponijî: Çawa dikarim bi aramî ji vir biçim bê ku hest bi xemgîniyê bikim? Na, bê ku kul

bikevin dilê min, ez nikarim ji vî bajarî derbikevim. Min rojên dirêj ên têrjan di

nav dîwarên kelên vî bajarî de borandine, û şevên min ên bêkesî û  
tenêtiyê dirêj  
bûne; û ma kî dikare dev ji bêkesî û jana xwe berbide bê ku bêriya wan  
bike?  
Min gelek perçe ji giyanê xwe li van kuçe û kolanan belav kirine, bêhejmar  
zêde  
zarokên bêriya min li van zinaran rûs û pêxwas digerin û ez nikarim bê  
jan û bê  
bargiranî ji vir bifilitim û wan bihêlim. Îro ez ê perdeyê ji ser xwe ranekim  
lê bi  
destên xwe çermê laşê xwe vebirûçînim. Ê ez ê ne ramanan lê dilê xwe  
yê tînî û  
birçê nerimandî li pey xwe bihêlim.  
Lê dîsan jî nikarim demek dirêj li vir bimînim. Derya, ya ku bangî hemûyan  
dike,  
gazî min jî dike, divê ez bikevim nav keştiyê. Yê hingê jî bimîne dema gav  
di  
şevê de diherikin, ew ê biqerise, bicemide û bibe qalib. Bi kêfa dilê xwe  
min ê  
her tişt ji vir bi xwe re bibira lê ez ê çawa wisan bikim? Deng nikare ziman  
û  
lêvan, ên ku bask danê, bi xwe re bibe. Divê ew bi tena serê xwe li  
valahiyê  
bigere. Ê bi tenê û bê hêlîn divê baz ber bi rojê de bifire.  
Ku ew giha binê zinar, wî dîsan li deryayê nerî û dît ku keştiya wî nêzîk  
dibe. Di  
pîj û kepiya wê de deryavanên hevvelatîyên wî hebûn.

Û canê wî bangî wan kir, û wî got: Ey kurên pîredayika min, seyirvanên daketin  
û hilketina ava deryayê. Ax ka hûn çend caran di xewnên min de li deryayan  
seyirîne û niha, li şiyarbûna min, hûn digihin vir. Amade me ji bo çûnê, û bêriya  
min tenê li benda bayekî ye ku bawanên (babirkên) min belav bike. Dixwazim  
ku tenê carek din jî bîn bikim vî hewayê aram, tenê carek din jî dixwazim awirek  
nazenîn li pey xwe bigerînim. Paşî ez ê di nav we de bim, ez jî deryavan di nav  
deryavanan de. Û tu, deryaya bêsînor, dayika bêxew, tu tenak aramî û azadî ji  
vî çemî û vê herikê re, tenê zivirokek din jî ev çem dixwaze bike, tenê carek din  
jî li vê meydanokê bixwişe. Û hingê ez ê bigihim hemêza te, hemêza dilopek  
bêsînor, ya oqyanûsek bêyom.  
Û di dema meşa xwe de wî dît ku jin û mêran karên xwe li nav rez û zeviyan  
dihîştin û ber bi deriyên kela bajar de xwe dilezandin. Û wî bihîst ku navê wî li  
ser zimanê xelkê ye û xelk ji hevdu re ji zeviyekê ta ya din diqîrin ku keştiya wî  
gihaye.  
Û wî ji xwe re got: Ma roja veqetîna ji hev dikare bibe roja hevgihînê? Ma dikare

bê gotin ku roja koça min di rastiye de berbanga spêdeya min e? Ma dikarim ji

wî, yê ku gêsîne xwe di erdê re hiştîye, yan jî ji wî, yê ku pêçke û xirxalê tirîzirviçîna xwe rawestandiye, re çî bibêjim? Ma dilê min dê bibe darek fêkîder

ku fêkî bicivînim û bidim wan? Ma divê hêviya min mîna kaniyekê biherike daku

bikarim îskan û qedehên wan dabigirim? Ma ez çeng û centûr (sentûr) im ku

destê yê bihêz li ser bigere yan jî bilûr im ku tê re bipife? Ez lêgerê bêdengiyê

me, û ma min ji bêdengiyê çî gencîneyek wisan dîtiye ku bikarim wek nihîn li

wan belav bikim? Eger ev roj bi rastî jî roja rakirana dexl û danan be, ma min

kîjan zevî tovandine û li kîjan bîskên jibîrbûyî? Eger bi rastî jî ev ew gav û bîsk

be ku divê ez fanosa xwe hilbidim jor, çirûskek tê de be jî ne ya agirê min bi

xwe ye. Fanosa min bi xwe vala û tarî ye. Govanê şevê wê dadigire û herwiha

vêdixe jî.

Wî ev ramanên xwe bi gotin anîn ziman lê di dilê wî de hê gelek tiştên negotî jî

man çimkî wî nedikarîbû berşê û veşartiyên di dilê xwe de derbibe.

Dema ew giha bajar, hemû gelî pêşwazî lê kir û, mîna ku ji yek dev be, hemû

diqîrîn. Mezin û pêşiyên bajar derketin pêş û ji wî re gotin: Hê niha ji nik  
me  
neçe. Tu di tarîti û şêlîtiya me de nîvroyek geş î û ciwaniya te hêvî daye  
hêviyên  
me. Di nav me de tu ne biyanî û ne jî xerîb î lê kurê me yî û em pirr ji te  
hez  
dikin. Wisan neke ku em çavên bêriya rûyê te bikin.  
Qeşe û qeşeneyan gotê: Wisan neke ku pêlên deryayê me ji hev biqetînin  
û  
nehêle ku salên te li vir borandî tenê bibin bîranîn. Tu mîna giyanekê di  
nav me  
de meşiyayî û sîbera te ji rûyên me re mîna ronahiyê bûye. Me pirr ji te  
hez  
kiriye lê bêpeyv û bi perdeyê nimixandî bû hezkirina me. Lê dîsan jî niha  
jiyana  
hezkirina me bi dengbilindî bangî te dike û xwesteka xwe derdibe. Û  
hezkirin, ji  
bilî dema veqetîna ji hev, kûratiya xwe nanase.  
Û yên din jî hatin û bi dilsozî daxwaz jê kir ku ew bimîne lê wî bersiva wan  
neda.  
Wî tenê xwe çemand; û wan kesan, ên ku li nêzî wî bûn, didît ku ronik ji  
çavên  
wî diwerîn ser sînga wî. Û ew jî bi girseya gel re ber bi meydana ayîngehê  
de  
meşî. Ji wê pîrozgehê jinek bi navê Almitra derket. Ew jin pêşbîn bû. Wî  
bi  
nazenîniyek bêpayan li wê nerî çimkî ew jin yekem kes bû ku li wî gerîbû  
û hê ji

roja yekem ve bi wî bawer hebû. Û wê ew silavand û gotê: Peyamberê  
Yezdan,  
ê ku tu li cîhanê li tiştê herî kûrwate digerî, bi heyamek pirr dirêj li benda  
keştiya ji deryayê bê mayî. Niha keştiya te hatiye û divê tu biçî. Bêriya te  
ya ji  
bo welatê bîranînên te û warê mezintirîn hêviyên te gelekî kûr e; û evîna  
me  
nikare te li vir bigire û jana me jî nikare te berbend bike. Lê em hêvî dikin  
ku, ji  
berî ku tu ji vir biçî, ji me re bipeyive û me ji hinek rastiya xwe hevpar  
bike. Em  
ê wê rastiye bidin zarrên xwe û ew ê jî bidin zarokên xwe û bi vî awayî  
rastî dê  
ti caran ji bîr nebe. Di bêkesiya xwe de te bi çavên xwe li rojên me neriye  
û di  
şiyariya xwe de te guhdarî ken û giriyê xewa me kiriye. Ji ber hindê wisan  
bike  
ku em xwe binasin û ji me re bas bike û her tiştê tu fêr bûyî ku di navbera  
jiyan  
û mirinê de heye, ji me re jî bibêje.  
Û wî bersiv da: Gelê Orfaleseyê, ma ji bilî wan tiştan, ên ku niha jî di can  
û  
giyanê we de dilivin, zêdetir dikarim basa çî bikim.  
Hingê Almitrayê got: Ji me re ji Evînê bipeyive.  
Û wî serê xwe rakir û li gel nerî û bédengî daket ser wan. Û ew bi dengek  
bilind  
axivî: Dema evîn bangî we bike, bidin pey wê tevî ku rêyên wê asê û  
rizdeyî ne jî.

Û dema baskên wê we bikişînin hemêza xwe, radestî wê bibin tevî ku şûrê  
xwe di  
nav perrên wê de veşartî dibe ku ziyanê bigihîne we. Û dema ew ji we re  
biaxive,  
ji gotinên wê bawer bikin tevî ku dibe dengê wê xewnên we biperçiqînin  
mîna ku  
çawa bayê bakur jî dibe ku baxçeyan biruxîne. Ji ber ku ka çawa evîn we  
ditacîne,  
ew herwiha we diçarmixîne jî. Çawa ku ew we zêde dike, ew herwiha we  
ditelifîne  
jî. Çawa ku ew hildikeve jor û naziktirîn çeqên we, yên ku li ber tîrêjê  
dilerizin,  
dihemêzîne, ew herwiha dadikeve ber reh û rîşên we, yên ku tê dikoşin  
ku di erdê  
pêt û bihêz bin, jî vediweşîne.  
Evîn mîna guliyên genim we bi xwe ve digire. Ew we li benderê digêrîne  
daku we  
çiptazî bike. Ew we li bêjing û mûxelê dike daku xirşan ji nav we biavêje.  
Ew we  
dihêre ta ku hûn spî bibin. Ew we diguherîne ta ku hûn bîn çemandin. Û  
dû re ew we dispêre agirê xwe yê pîroz daku hûn bibin nanê pîroz ji bo  
cejna pîroz a  
Yezdan. Evîn hemû vê yekê dike daku hûn ji nihînen dilê xwe haydar bin,  
û bi vê  
zanîne hûn bibin beşek ji dilê Jiyanê.  
Lê eger hûn bitirsin û tenê dilşadî û aramiya evîne hevî bikin, hingê baştir  
e ku

hûn perdeyekê bidin ser tazîtî û rûsiya xwe û evînê jî li benderê bihêlin û herin wê cîhanê, ya ku demsal lê nîn in, ya ku lê hûn dikarin bikenin lê ne hemû kenê xwe yan jî lê bigirîn lê ne hemû ronikên xwe. Evîn bi tenê ji xwe dide û ji beşa xwe dîsan distîne. Evîn tişteki nadêre, ne xwedîya tişteki ye û ti kesek jî nikare wê bidêre çimki evîn ji evînê re bes e, têra wê dike.

Dema hûn tişteki bievînin, nebêjin "Yezdan di dilê min de ye" lê çêtir e "Ez di dilê

Yezdan de me". Bawer nekin ku hûn ê bikarin rêkêşiya evînê bikin çimki, eger ew

we hêjayî hindê bibîne, ew ê serkêşiya we bike.

Evîn tişteki naxwaze ji bilî wê yekê ku dixwaze xwe bi xwe bi cî bîne. Lê eger hûn

tişteki bievînin û nikaribin dev ji xwestek û hêviyên xwe berbidin, bila hêviyên we bi vî şeweyî bin: Bila bihelin û bibin mîna robarek herikbar ê ku bi şevê awazên xwe distrê, bila fêrî nasîna jana nazenîniya gelek zêde bibin, bila bi destlêkirina evînê birîndar bibin û bila bi dilxweşi û dilşadî xwîna xwe birijin. Bila bi berbanga spêdeyê re bi baskan di dilî de şiyar bibin û ji bo rojek nû ya evînê spasiyê bikin, bila nîvroyê bîna xwe bidin û li ser jihalçûna evînê baponijin, bila êvarê wek spasdar vebigerin malê û bila lava û dua ji bo hezkiriya/ê xwe û siroda spasdariyê li ser lêvan paşi rabikevin û binivin.

Hingê Almitra dîsan peyivî û got: "Hûn ji Zewacê çi dibêjin, mamoste?"

Û wî wiha bersiv da:

Hûn bi hev re welidîne û divê bi herherî bi hev re bin. Dema baskên spî yên

mirinê rojên we biruxînin jî, divê hûn bi hev re bin. Belê, ta dema ku hûn di



bêdengiyê de Yezdan bi bîr tînin jî, divê hûn bi hev re bin. Lê bihêlin ku navbeynek di navbera we de hebe û bihêlin ku bayên esman di nav we de

bireqisin.

Ji hev hez bikin lê evînê nekin bend û zincîr. Bihêlin ku zêdetir ew di navbera

qeraxên giyanên we de wek deryayek livbar be. Qedehên hev dabigirin lê ji

qedehên hev venexwin. Ji nanê xwe bidin hev lê herdu ji heman nanî nexwin. Bi

hev re bistrin û bireqisin û kêfxweş bin lê bihêlin ku her yek ji we bi tena xwe jî

be mîna ku tîlên 'ûdê ji hev cuda ne tevî ku her heman awaz wan dilerizîne.

Dilên xwe bidin hev lê ne ji bo ku her yek ji we li nik xwe biparêze çimkî tenê

destê Jiyanê dikare dilê we biparêze. Ê bi hev re li ser piyan bin lê dîsan jî ne

zêde nêzî hev çimkî stûnên ayîngehê ji hev dûr in û herwiha gûz û dara selwiyê

jî li ber sîbera hev şên nabin.

Ê jinekê, ya ku zarokê li milî bû, got: Ji me re dabaş ji Zarokan bike.

Ê wî got:

Zarokên we ne zarokên we ne. Ew kur û keçên bêrîkirina Jiyanê ne. Ew di we re

lê ne ji we tên. Ê tevî ku ew li cem we ne jî, ew ne malê ne.

Hezkirina xwe bidin wan lê ramanên xwe nedinê çimkî wan ramanên xwe bi xwe

hene. Hûn dikarin matî ji û çavneriyê li bedenên wan bikin lê ne li canên wan  
çimkî giyanên wan di jîngeha roja sibê ve dijîn ku hûn di xewnên xwe de jî  
nikarin biçinê. Hûn dikarin tê bikoşin ku bişibin wan lê nedin xwe ku wan  
bişibînin xwe çimkî jiyana ber bi paş de naçerixê û di roja borî de jî  
nasekine. Hûn  
kevan in ên ku zarokên we wek tîrên jîndar jê tîrên pijiqandin, jenandin û  
virandin. Tîrvan bineciyê rêwîtiyê li ser rêya bêdawî dibîne û Ew we bi  
hêza xwe  
diçemîne daku tîrên Wî bi lezgînî û dûr biçin. Bi dilxweşî di destên Tîrvan  
de  
biçeme çimkî çawa ku ew ji wan tîran, ên ku difirin, hez dike, ew herwiha  
ji wê  
kevanê, ya ku bêhej e, jî hez dike.  
Hingê zelamek dewlemend got: Ji me re basa Danê bike.  
Û wî bersiv da:  
Dema hûn tenê ji malîyeta xwe didin, hûn kêr didin. Tenê dema hûn ji  
xwe bi  
xwe tiştêkî didin, hûn bi rastî didin. Çimkî ma malîyeta we çî ye ji bilî wan  
tiştan  
ên ku hûn bi xwe dihêlin û çavneriyê lê dikin ji ber ku hûn ditirsin ku sibê  
pêwîstiya we pê hebe? Û sibe, ma sibe ji kûçikê destvegir, ê ku di dema  
rêwîtiya  
xwe ya bi haciyana re ber bi bajarê pîroz de hestiyana li xîzistanek bêşop  
binerd  
dike, re tîne? Û ma tîrsa pêwîstiyê ji bilî pêwîstiyê bi xwe çî ye? Ma tîrsa  
tîrîtiyê li

wê demê, ku kanî tijî av e, ne ew tînîtî ye ku ti tiştê nikare bişkîne û vebimirîne?  
Hingê piçekî ji gelekê didin - û ew ji bo rûmetê didin û xwestekên wan ên veşartî  
ziyanê digihînin diyariyên wan. Ê herwiha kesên wisan jî hene ku kêma heye lê her  
tiştê xwe didin. Ew ji jiyane û bereketa wê bawer dikin loma tabûta wan ti caran  
vala nabe. Hin hene ku bi dilxweşî didin, û dilxweşî para wan e. Hin hene ku bi jan  
didin, û jan para pakkirina wan e. Hin ên wisan jî hene ku bê hestpêkirina janê  
didin û ew pê li dilxweşiyê jî nagerin û dana wan ne ji ber xêrê ye jî. Ew wisan  
didin ku çawa gul jî li geliyê dûr xweşbîna xwe difûrîne valahiyê. Di destên wisan  
re Yezdan dipeyive û ji paş çavên wan Yezdan li cîhanê dibişire.  
Baş e ku bê dan eger hatibe xwestin lê hê jî baştir e ku bêxwestin bi têgihîn bê  
dan. Ji bo destvekirî û merdan ji danê çêtir ew e ku li kesek pêwîstî bi alîkariyê  
heyî bigere. Ê ma tiştê heye ku dikarî bi xwe re bihêlî? Her tiştê te heyî divê  
rojekê bidî û dev jê berbidî. Loma niha bide daku heyama danê ne ya mîratxwerên te lê ya te bi xwe be. Pirrî caran dibêjî: "Dixwazim tenê  
bidim wan  
ên ku hêjayî danê ne." Lê ne darên cinîna te û ne jî kerên pez li çerîngehên te

wisan nabêjin. Ew didin ji bo ku bikarin jîndar bimînin çimkî eger ew nedin, ew ê biruxin. Bêguman e ku her kes, ê ku hêjayî şev û rojên xwe be, hêjayî her tiştî ye ku tu bikarî bidiyê. Û her kes, ê ku têra xwe binirx e ku ji oqyanûsa jiyane vebixwe, hêjayî wê yekê ye ku qedeha xwe ji robarokê te jî dabigire. Û ma ji wê hêjayiyê mezintir tişteke heye ku mirov ne ji ber merhametê û dilpêşewitînê lê bi mêranî û pêbawerî tişteki pêşwaz bike. Û ma tu xwe çî dihesibînî ta ku mirov bersînga xwe biçirrîne û serfiraziya xwe derbike daku nirxa wan rûtkirî û serbilindiya wan jî bi bêşermî bibînî. Binere ku tu bi xwe hêjayî wê yekî bî ku bibî diyarîder û alavek danê çimkî bi sond jiyane dide jiyane - û tu, yê ku xwe wek danvan dihesibînî, bi xwe tenê govan û şahid î. Û hûn, ên ku werdigirin - û hûn hemû wergirin - eger hûn nexwazin ku nîrê dîlî û êsîriyê li ser serê we û yê danvan be, tê nekoşin ku hûn qaşo spasdar in. Hê baştir e ku tu jî bi danvan re bi wan diyariyan hîlbikeve mîna ku ew diyarî ji we re bask bin çimkî eger tu qenciya li te kirî gelekî zêde bihesibînî, tu ji merdiya wî, ya ku dayika wê erda dilvekirî û bavê wê jî Yezdan e, biguman î. Û dû re zelamek pîr, xwediyê xanekî got: Ji me re basa Xwarin û Vexwarinê bike.

Û wî bersiv da: Hêvî dikim ku we bikariya mîna şênkatîyan ji ronahî û bîna  
erdê  
bijîna. Lê ji ber ku divê hûn ji bo xwarinê bikujin û ji bo vemirandina tîna  
xwe  
divê hûn şîr ji maka nûzayî bişelînin, xwarin û vexwarinê bikin xebatek  
ayîndarî.  
Û maseya xwe bikin altar ku pakî û bêguneyiya deşt û daristanan ji bo wê  
yekê  
ya ku di mirov de hê jî paktir û bêgunetir e. Dema hûn lawirekî bikujin, di  
dilê  
xwe de jê re bibêjin: "Heman hêz, a ku te dîkuje, dê min jî bîkuje: û ez jî  
dê  
bê m telifandin. Çimkî ew zagon, a ku tu xistî destê min, dê min jî bixe  
destek hê  
bihêztir. Xwîna min û xwîna te tenê benîşt e ku esman vediweşîne."  
Û dema sêvekê bi didanên xwe diperçiqînî, di dilê xwe de jê re bibêje:  
"Tovê te  
dê di bedena min de şên bibe û bûtikên te yên sibê dê di dilê min de  
bibîşkin.  
Û bîna xemla te nefeskişandina min e. Û em ê bi hev re ji hemû demsalan  
zewq  
û xweşiyê bibînin."  
Û payizan, dema wîşiyên tirî dicivînî tirîzirviçîna xwe, di dilê xwe de  
bibêje: "Ez  
rezim û fêkiyê min di tirîzirviçînê de tê komkirin. Û mîna meya nû, ez jî  
dê di  
amanên ebedî de bê m parastin." Û zivistanan, dema tu meyê vedixwî,  
bila dilê te

ji bo her qedehekê bistre. Û bila di stranan de bîranîn û silav li rojên  
payizê, rez û

tirîzirviçînê hebin.

Dû re cotkarekî got: Ji me re ji Kar bas bike.

Û wî wiha bersiv da:

Hûn dixebitin daku bi tevgera erdê û giyanê erdê re hev bigirin çimkî yê  
bêkar dê

ji demsalan xerîb bibe û ji karwanê jiyanê, yê ku bihêz lê bi sernermî ber  
bi

bêsînoriyê de dileqize, vebiqete.

Dema hûn kar dikin, hûn dişibin bilûrekê ya ku di dilî de pistîna demê dibe  
awaz.

Ma kî ji we dixwaze qarota giyayekî be, bédeng û bêpêjn di wê demê de  
ku hemû

yên din bi hev re distrin?

Hertim ji we re hatiye gotin ku kar nefret û xebitînn jî bextreşî ye. Lê ji we  
re

dibêjim ku bi karkirina xwe re hûn beşek ji wê dûrtirîn aşop û xeyala  
cîhanê, ya

ku hê di dema berpêbûna wê xewnê de ji we re wek erk hatibû diyarkirin,  
bi cî

tînin. Û bi xebatkirinê re hûn bi rastî jî dievînin. Û yê ku bi xebitînê ji jiyanê  
hez

bike, ew ê di kûrtirîn nihîna jiyanê bigihe. Lê eger hûn janan bikişînin,  
hebûna

xwe wek bextreşiyekê binifirînin û jiyandina bedena xwe wek nifirek li  
eniya we

nivîsî bihesibînin, hingê bersiv didim ku tenê bi xuha eniya we ew nivîs dikare

bê jêbirin.

Ji we re hatiye gotin ku jiyan tarîti ye, û hûn kerixîne û bûne dengvedana wan

yên ji jiyane kerixî. Ê ez ji we re dibêjim ku jiyan bi rastî jî tarîti ye eger hêvî

tine be. Ê hêvî jî kor e eger zanîn tine be. Ê hemû zanîn jî bêşûd e eger xebat

tine be. Ê xebat jî bêşûd e eger hezkirin tine be. Ê dema bi hezkirinê kar bikin,

hûn ê xwe hem bi xwe bi xwe re û hem jî bi hev re û bi Yezdan re girê didin.

Ê kar çawa bi hezkirinê tê kirin? Ew dirûna qumaş a bi wan deziyan ên ku we ji

dilê xwe kişandine, her wisan mîna ku evîndara te dê wî cilî li xwe bike. Ew bi

dilsaxî avakirina xaniyekî ye her wisan ku evîndara te dê tê ve bijî. Ew bi dilnermî avêtina tov û bi dilxweşî rakirina berhemê ye mîna ku evîndara te dê

wê berhemê. Ew bi nefeskîşandina ruha te biçimandin û tişedana hemû karê te

afirandî ye. Ê zanîna wê yekê ye ku hemû pakrewanên sitirandî û biheştî li dor

te ne û li te dinerin.

Min pirrî caran bihîstiye ku hûn, mîna ku di xewê de bipeyivin, dibêjin: "Yê ku

mermer bihincirîne û kûre bike û tişe û şikilê ruha xwe bidiyê ji wî  
gewertir e yê  
ku zeviyê dikê. Ê yê ku dest diavêje bûka baranê daku wê bixe ser cilekî  
mêrxastir ji wî yê ku kalik û sendelan ji bo piyên me çêdike." Lê ez, ne di  
xewê de  
lê şiyar li nîvroyek ron û zelal, dibêjim ku ba ji giyakê herî biçûk re hê  
naziktir jî ji  
dargûza girs re dipiste. Ê tenê ew mezin e yê ku dikare bi hêza evîna xwe  
strana  
ba hê jî bedewtir bike.  
Kar evînek berçav e. Ê eger tu nikarî karê xwe bi dilxweşî lê tenê bi dilreşî  
bikî,  
baştir e ku tu dev ji karê xwe berbidî û li ber deriyê ayîngehekê rûbinî û ji  
wan,  
ên ku bi dilşadî kar dikin, xêr û zekatan bixwazî. Ji ber ku eger tu bi  
bêmereqî  
nan bipêjî, tu dê nanek tal bipêjî ku dê tenê bi nîvî birçê nehê. Ê eger  
tu bi  
bêdilî tirî bizirviçînî, bêdiliya te dê jarê biçipîne nav meyê. Ê tevî ku tu  
mîna  
firîşteyan jî bistrî lê ji strîne hez nekî, tu dê guhên xelkê bimismidînî û  
bistimînî  
ku ew dengên şevê û rojê nebihîzin.  
Paşî jinekê got: Ji me re ji Kêfxweşiyê û Xemgîniyê biaxive.  
Ê wî bersiv da:  
Kêfxweşiya we xemgîniya we ya neniximandî ye. Ê heman kanî, ya ku  
kenê we



jê dizê, pirrî caran tijî ronikên we ye jî. Û ma ew dikare ne wisan be? Û  
her çi  
qas xemgînî hebûna we kûrtir birene û biqewêre, dibe ku hê zêdetir  
kêfxweşî di  
we de hebe. Ma ew qedeh, a ku tijî mey e, ne her heman qedeh e ya ku  
di  
kûreya qedehçêker de hat sotandin û qijqijandin? Û ma ew 'ûd, a ku dilê  
we  
aram dike, ne ji heman darê ye ya ku bi kêran hat bêweckirin? Dema tu  
kêfxweş bî, kûr li dilê xwe binere û tu dê agadar bibî ku tenê ew tişt, a ku  
xemgîniyê dike para te, herwiha kêfê jî dide te. Dema ketibî bin barê  
xeman,  
dîsan jî li dilê xwe binere û te dê hay jê hebe ku bi rastî jî bi wê tiştê digirî  
ya ku  
kêfxweşiyê jî ji te re tîne.  
Hin ji we dibêjin: "Kêfxweşî ji xemgîniyê mezintir e." Hin jî dibêjin: "Na,  
xemgînî  
mezintir e." Lê ez ji we re bibêjim ku ew nikarin ji hev bîn veqetandin.  
Ew bi  
hev re tîn û eger yek ji wan tenê bi te re rûniştibe, bila li bîra te be ku ya  
din di  
nav nivînên te de raketiye.  
Bi rastî jî hûn di navbera kêfxweşî û xemgîniya xwe de mîna teraziyê  
dadikevin  
û hildikevin. Tenê hingê, ku hûn vala bin, hûn bêliv, bitewş û parsengî ne.  
Dema  
xwediyê gencîneyê we radike daku zêr û zîvên xwe biwezinîne, hingê divê  
kêfxweşiya we yan jî xemgîniya we hilbikeve yan dabikeve.

Dû re xanîçêkerek hat nik wî û got: Ji me re basa Xaniyan bike.

Û wî bersiv da û got:

Ji berî ku hûn avahiyekî di nav kelên bajar de ava bikin, xaniyekî di aşop  
û

xeyalên xwe de li çolistanekê ava bikin. Ji ber ku dema hûn bi tarîketina  
êvarê

re tên malê, di heman demê de di we de gerokek herherî xerîb û bêkes  
bi we re digihe malê. Xaniyê we bedena we ya berfiretir e. Ew di tavidana  
rojê de mezin

dibe û di bédengiya şevê de dinive. Şevên xaniyê we ne bêxew in. Ma  
xaniyê we xewnan nabînin? Û di xewnên xwe de bajar bi cî nahêlin daku  
li gupikên çiyayan û li nav daristanan bigerin?

Xwezî min bikariya xanîkên we bicivînim nav destê xwe û mîna tovavêjan  
wan li nav daristanan û mêrgan belav û pelate bikim. Xwezî gelî kuçeyên  
we bûna û rêkên hêşîn kolanên we bûna daku we bikariya li nav rezan li  
hevdu bigerana û li dema hevghana we bîna xweşik a axê ji kincên we  
bihata. Lê hê ji bo vê yekê zû ye. Di tirsaxwe de bavkalên we zêde nêzî  
hev cîwar bûn. Ev tirs dê hê demekê bidome. Hê mideyek maye ku kelên  
bajaran dilên we ji zeviyên vebiqetînin.

Ji min re bibêjin, ey gelê Orfaleseyê, ka we di van xaniyan ve çi heye? Û  
hûn bi

van deriyên qilifandî û qeraxkirî zêrevanî û goyîniyê li çi dikin? Ma we tê  
ve aşî

û aramî heye ku hêza we dizeximîne? Ma we bîranîn, kevaneyên biriqok  
hene ku

li raserî bilindiyên giyanê xwe ditewînin? Ma we bedenî heye ku dil ji  
tiştên darîn

û kevirîn vediqetîne daku ji bo dîtina çiyayên pîroz bigere?

Ji min re bibêjin, ma we ev tişt di xaniyên xwe ve hene. Yan jî ma we bi tenê  
xweşî û xweşîxwazî heye ku wek mêvan xwe dixwişîne mala we, dû re dibe  
xwediyê malê û paşî dibe mamosteyê we? Belê, xweşîxwazî we kedî dike  
û  
dixesîne û bi astengdanîn û îşkencedana we ew xwestekên we yên herî mezin jî  
dike mîna bûkokek pepûk. Tevî ku destên wê armûşî ne jî, dilê wê ji asin e. Ew  
we bi lorînê dixewîne tenê daku li ber nivîna we rabiweste û henekan bi laşê we  
bike. Ew qerfên xwe bi sehên we yên saxlem dike û wan mîna amanên şkêbar di  
nav pûrtikê giyagezokan de radipêçe. Çimkî bi rastî jî xweşîxwazî evîna giyanê we  
dikuje û paşî devbeş û bi girnijîn bi karwanê taziya we re dimeşe.  
Lê hûn, zarokên valahiyê, hûn ên di nav aramiyê de nearam, divê hûn nekevin  
xefik û davan û neyên xesandin. Divê xaniyên we ne sing lê stûn bin. Nabe ku ew  
pergî û pizdanek teyisok be ku birîna we vebişêre lê divê ew palik û miçkuliyek be  
ku çav biparêze. Diviyabû hûn baskên xwe danedin ji bo ku hûn bikarin di derî re  
biçin hundur, ne serên xwe biçemînin daku ew bi ban nekevin û ne jî ji nefeskişandinê bitirsin ji ber ku belkî pê dîwar biherifin û bi ser we de bikevin.

Divê hûn di gorrên miriyan ji jîndaran re ava kirî de nemînin. Û tevî hemû biriqdarî û qeşengiya xwe jî, xaniyên we nikarin nihînên we vebîşêrin û bêrîkirina

we bisitirînin. Çimkî tiştê di we de bêsinor di jîngeha ewran de ye ku deriyên wan

mija spêdeyê û pencereyên wan jî stranên şevê û bêdengî ne.

Û qumaşfiroş got: Ji me re basa Cilan bike.

Û wî bersiv da:

Cilên we gelek ji bedewiya we diniximînin lê dîsan jî nebedewiya we venaşêrin.

Tevî ku hûn bixwazin bi lixwekirinê xwe ji awiran vebîşêrin jî, cilên we pirrî

caran ji we re tenê zirx û zincîr in. Xwezî we ne tenê hest bi cilên xwe lê li ser

laşê xwe hest bi tavê û ba jî bikira çimkî nefesa jiyanê di tavê de û destê jiyanê

jî di nav ba de ye.

Hin ji we dibêjin: "Bayê bakur cil raçandine ji bo ku em li xwe bikin." Û ez dibêjim: Rast e, bayê bakur ew raçandine. Lê şerm qumaşê wî û sistbûna endamên laşê we jî tevnê wî bûye. Û dema bayê bakur karê xwe qedand, ew li

nav daristanê bi we kenî. Ji bîr nekin ku şermî mertalê ber çavên qirêj e. Û dema qirêjî nema, êdî şerm tenê zincîr û lewitandina dil e. Û bila ji bîra we neçe

ku erd bi pêxwasiya we şa dibe û ba dixwaze bi pirça serê xwe bilîze.

Û dikandarekî got: Ji me re basa Kirîn û Firotinê bike.

Û wî bersiv da û got:

Erd fêkiyê xwe bi we dibexîşîne û eger hûn tenê bizanin destên xwe tijî bikin, hûn ê kêmasiyê nebînin. Bi guherandina diyariyên erdê hûn dikarin têr û bi kêfxweşî bijîn. Lê eger guherandin ne bi hezkirinê û dadperwerî be, ew dê hin kesan ji we bike hesûd û hin ên din jî dê birçî bimînin.

Dema hûn, ên ku li deryayê û li nav zeviyan û rezan dixebitin, li bazarê pêrgî qumaşfiroş, cerçêker, berhevkerên biharatan û hwd. tên, hingê bangî giyanê herî berz ê cîhanê bikin ku bila bê cem we daku hûn bi dadperwerî biwezînin û bipîvin.

Nehêlin ew, ên ku destên wan bêxêr in, tevî bazara we bibin çimkî dibe ku ew gotinên xwe bi karê we bidin. Divê hûn ji kesên wisan re wiha bibêjin: "Bi me re werin nav zeviyan an jî bi birayên me re herin deryayê û torrên xwe biavêjin çimkî hem bejî û hem jî derya ji me û we re merd û destvekirî ne."

Û eger stranbêj, reqîsvan û bilûrvan bên, ji diyariyên wan jî bikirin çimkî ew jî fêkî û giyadermanan berhev dikin û tişt, ên ku ew pêşkêş dikin, tevî ku ji xewn û xeyalan hatine raçandin jî, ew jî ji giyanên we re xwarin û cil in.

Û ji berî ku hûn bazargehê bi cî bihêlin, binerin ku kes destvala neçe çimkî ta ku

pêwîstiyên ên herî kêr jî nehatibin bicîanîn, giyanê cîhanê nikare li ba bayan bi

aramî binive.

Paşî dadgerek ji yên bajar derket pêş û got: Ji me re basa Tawan û Cezayê bike.

Û wî bersiv bi van gotinan da:

Dema canê we bi ba re digere, hûn, wek bêkes û bêparêz, xerabiyê li kesên din

dikin û ew xerabî li we bi xwe jî dibe. Û ji ber xerabiya we kirî divê hûn deriyê

pîroz biqutin û bîskeke, bê haya kesekî, bipên.

Eziya we ya yezdanî mîna oqyanûsê ye û hertim neherimandî dimîne. Û mîna

valahiyê, ew jî tenê yên bibask radike. Eziya we ya yezdanî herwiha mîna rojê

ye jî. Ew rêyên koremişkan û kunên maran nanase. Lê di we de ne tenê eziya

we ya yezdanî heye. Di we de pirr tişt hê mirovî ne û hin jî hê nebûne mirovî jî

lê mîna bejnbostek bêtişte ne ku di xewa xwe de di nav mijê de dimeşe û li

şiyarbûna xwe digere. Û niha ez dixwazim ji miroviya di we de bipeyivim çimkî

ne bejnbostê di we de û ne jî eziya we ya yezdanî lê miroviya di we de tawanê û

cezayê tawanan dinase.

Pirrî caran min bihîstiyê ku hûn basa wî mirovî, yê ku tawanê dike, wisan dikin

mîna ku ew ne ji we be lê mîna ku ew biyanî û dagîrkerê cîhana we be. Lê  
ji we  
re dibêjim ku ka çawa yên dadperwer û pîroz nikarin ji wê yekê, ya ku di  
her  
yekî ji we de heye, bilindtir hilbikevin, wisan yên xerab û lawaz jî nikarin  
ji wê  
yekê, ya ku di we de heye, jêrtir dabikevin. Ê çawa ku pelek bi tenê bê  
hay û  
zanîna darê jê nikare zer bibe û bibeye, wisan xerabîkar jî bê dilxwaziya  
we ya  
xerabîkirinê nikare xerabiyê bike. Mîna karwanekî hûn bi hev re ber bi  
eziya xwe  
ya yezdanî de dimeşin. Hûn bi xwe rê û rêwî ne. Ê dema yek ji we dikeve  
erdê,  
ew ji bo yên li pey xwe dikeve daku ew li xwe hişyar û biseqbêr bin daku  
li  
heman keviran nehilingivin.  
Ê bila ev jî li bîra we be tevî ku ev gotin giran bin û bi dilê we bikevin jî:  
Yê kuştî  
jî tawankarê mirina xwe ye. Ê ew, ê ku tê şelandin, jî li hember şelandinê  
ne  
bêtawan e. Yê dadperwer jî li hember xerabîkariyê ne bêgune ye. Ê yê  
destspî jî  
ne paqij e lê di kiryara tawankar de sûcdar e. Belê, pirrî caran ê tawanbar  
gorî û  
qurbanê wî ye yê ku xerabî lê hatiye kirin. Ê hê jî zêdetir caran ê darizandî  
li barê

yê bêtawan û bêkêmanî hildigire. Hûn nikarin rastiye ji çewtiye û qenciye  
ji  
xerabiyê cuda bikin çimkî ew di bin rûye rojê de li rex hev in mîna ku çawa  
deziye  
spî û ye reş bi hev re hatine raçandin. Ê gava deziye reş piçî, divê raçîn li  
hemû  
qumaş û berqumaş binere û kêmasiyê bibîne.  
Eger kesek ji we bixwaze ku jina bêwefa û dilnesoz bibe pêşberî dadgehê,  
bila  
herwiha dilê mêr jî di teraziye de bê wezinandin û canê wê bê pîvandîn.  
Ê bila ew,  
ê ku dixwaze xerabîkar bidarizîne, herwiha li dilê ye tawanlêkirî jî binere.  
Ê eger  
kesek ji we dixwaze bi dadperwerî darizandinê bike û bivirê xwe li dara  
qirş  
vebiweşîne, pêşî reh û rîşên darê rind seh bikin. Ê bi sond ew ê bibîne ku  
rîşên  
qencî û xerabiyê, yê bereket û bêxêriye di dilê bêdeng ê erdê de li hev  
rapêçîne.  
Ê hûn dadger, ên ku dixwazin dadperwer bin, hûnê çi daraz û hikim bidin  
wî ye ku  
ne ji aliyê bedenî de lê ji aliyê giyanî de diz be? Ê hûn ê çi cezayê bidin wî  
ye ku  
bedenekê dikuje lê canê wî ji aliyê yê din de tê kuştin? Ê hûn ê wî, ye ku  
di  
kiryarên xwe de xapandin û çewisandinê dike lê ew bi xwe jî tê arandin û  
zeriyandin, bikişînin kîjan dadgehê?  
Ê hûn ê wan, ên ku poşmaniya wan ji xerabîkariya wan mezintir e, çawa



bidarizînin? Ma poşmanî ne tam ew ceza ye ya ku zagon, ku hûn dixwazin  
li pey  
bimeşin, diferimîne? Lê dîsan jî hûn nikarin yê bêtawan poşman bikin û  
poşmaniyê ji dilê yê tawanbar derbixînin. Poşmanî, bê ku bê vexwendin,  
bi şevê  
tê daku mirov şiyar bibin û li dilê xwe binerin û baponijin. Ma hûn ê çawa  
bikarin  
tê bigihin ka çi rast e eger hûn di ronahiya bêkêmasî de li kiryanan  
nenerin? Û  
hingê hûn ê ji nû tê bigihin ku serfiraz û berketî herdu jî mîna hev in ku di  
tarîtiya  
eziya xwe ya bejnboştî û eziya xwe ya yezdanî de li ser sînorê navbera roj  
û şevê  
digerin. Û hûn ê tê bigihin ku quncikkevirê ayîngehê ne ji nizmtirîn kevirê  
di  
bingehê wê re bilindtir e.  
Paşî zagonnasekî got: Tu ji zagonên me çi dibêjî, mamoste?  
Û wî bersiv da:  
Hûn bi danîna zagon û qanûnan gelekî kêfxweş dibin lê bi binpêkirina wan  
hê jî  
kêfxweştir dibin, mîna zarokan, ên ku li ber peravên oqyanûsê ji xwe re  
dilîzin,  
bênavberr kelên ji xîz ava dikin û bi ken û şahî wan kelan binpê dikin. Lê  
di  
dema avakirina kelên ji xîz de oqyanûs hin qûmê din tîne peravê. Û dema  
hûn  
kelan binpê dikin, oqyanûs bi we re dikene. Bi sond oqyanûs hertim bi  
bêguneyan re dikene.

Lê hûn ji bo wan kesan çî dibêjin ku jiyan jê re ne Oqyanûs e û zagonên mirovan danî jê re ne kelên ji xîz in lê jiyan jê re zinar û zagon jî jê re eskene û

mikar in ku dixwazin pê di zinaran re wêneya xwe bikolin? Ji bo yê kûd û lingxwar, ê ku kîn û nifirê diavêje reqisyaran, hûn çî dibêjin? Ji bo ga, yê ji nîrê

xwe hez dike û ask û xezalên nav daristanan wek gerok bêser û bêwec dihesibîne, hûn çî dibêjin? Û ji bo marê pîr ê ku êdî nikare çermê xwe biguherîne loma marên din wek tazî û bêşerm dihesibîne? Û ji bo wî yê ku hê zû

tê cejnan û têrxwarî û betilî ji wir diçe û dibêje ku hemû cejn zordarî ne û

cejnker jî zagonşkîn in?

Ma nikare di derbarê wan de bê gotin ku ew jî li ber tavê û tîrêja rojê ne lê wan

pişta xwe dayiyê? Ew tenê sî û sîberên xwe dibînin û sîberên wan zagonên wan in.

Ma roj dê ji bilî sîberavêjîyê ji van kesan re çî be? Û ma dirkandin û îtîrafkirina bi

zagonan dê ji bilî pindirîn û serşorbûn û lipeyçûna sîberan ji van kesan re çî be?

Ma neqşên li erdê çîzandî dikarin we, yên ku hûn rû ber bi rojê de dimeşin,

rabiwestînin? Ma çî direwşên ba serkêşîya rêya we, yên ku hûn bi ba re dimeşin,

dikin? Ma kîjan zagona mirovî we berbend dike eger hûn nîr û zincîrên xwe

bişkînin û li ber deriyê zindana kesekî jî nemînin? Ma hûn çima ji zagonekê bitirsin  
eger hûn bireqisin û li zincîrên asinê yê kesekî nehilingivin? Û ma kî dê we  
bikişîne dadgehê eger hûn perdeya xwe ji ser xwe biçirînin û wê di rêya kesekî de  
nehêlin?  
Ey gelê Orfaleseyê, hûn dikarin dengê deholê kêmbikin û têlên 'ûdê bipiçînin lê  
ma kî dikare strana balindeya teşîrê vebimirîne?  
Û bêjer got: Ji me re ji Azadiyê bipeyive.  
Û wî bersiv da:  
Min dîtiye ku hûn li ber deriyê bajar û li malan xwe diavêjin erdê û ayîndarî û  
îbadeta azadiya xwe dikin mîna ku çawa kole jî xwe dipindirînin û li hember  
stemkar wî dipesinînin tevî ku ew stemkar wan dişeliqîne û qamçî dike jî.  
Belê,  
min di nav bexçeyên ayîngehê û sîbera asêgehê de dîtiye ku çawa ji we yê herî  
azad azadiya xwe mîna nîr û kelepçeyan hildigirin. Û ji dilê min xwîn herikî çimkî  
hûn tenê hingê dikarin azad bin eger ku daxwaza lêgerîna azadiyê ji we re zirx be  
jî, eger ku hûn êdî ji azadiyê ne wek armanc û bicîhatinê bipeyivin.  
Hûn hingê bi rastî azad in eger rojên we ne bêyî kul û xeman bin û şevên we jî ne

bêyî kêmasî û xemgîniyê bin lê dema ew dorlêgirtinê li we dîkin û dîsan jî  
hûn tazî  
û berbendnekirî hildikevin raserî wan.  
Û hûn ê çawa bikarin hilbikevin raserî şev û rojên xwe eger hûn wan  
zincîran, ên  
ku we têgihîna nîvroya xwe li dema berbanga spêdeyê pê berbend kiriye,  
neşkînin  
çimkî bi rastî jî ew, a ku hûn wek azadî dinavînin, ji van zincîran a herî  
pihêt û  
bihêz e tevî ku xelekên wê li ber tavê dibiriqin û teyisa xwe didin çavên  
we jî. Û  
ma eger hûn azad bibin ji bilî pirtikên ji xwe bi xwe hûn ê dev ji çi  
berbidin? Eger  
hûn bixwazin zagonê nedadperwer hilbiweşînin, we bi xwe ew bi destên  
xwe li  
ser eniya xwe nivîsiye. Hûn ne dikarin bi şewitandina pirtûkên xwe yê  
zagonê û  
ne jî bi şûştina eniya dadgerên xwe wan zagonan biruxînin tevî ku hûn  
hemû ava  
deryayê jî derbidin ser. Eger hûn bixwazin ku stemkarekî ji ser textê wî  
biavêjin,  
pêşî baş binerin ku textê wî, yê ku di dilê we de ye, hatiye ruxandin çimkî  
ma  
stemkar dê çawan bikariya desthilatîyê li kesên azad û serfiraz bike eger  
di  
azadiya wan de stemkarî û di serfiraziya wan de jî rûreşî tine be. Û eger  
hûn

dixwazin ji xemên xwe azad bibin, kesekî ew nekirine barê we lê we bi  
xwe ew  
bijartine. Ê eger hûn dixwazin ji tirsax xwe bifilitin, ew tirs ne di destê yê  
hûn jê  
ditirsin de lê di dilê we bi xwe de ye. Bi rastî her hesta we di we bi xwe  
de bilebite  
û ew digihin hev, her tişt, hem ên ku hûn bêriya wan dikin û hem jî yên  
ku hûn jê  
ditirsin, hem ên nakok û hem jî yên ku hûn pûte pê didin, hem ên ku hûn  
hêvî  
dikin û hem jî yên ku hûn dixwazin jê birevin. Hemû ev tişt rapêçayî mîna  
tav û  
sî, ku cotên hev in, di we de dilivin. Ê dema sî diçilmise û wenda dibe,  
ronahiya  
bermayî ji bo ronahiyek din dibe sî. Ê bi vî awayî azadiya we jî, dema ew  
ji bend û  
zincîrên xwe azad dibe, bi xwe dibe nîr û zincîrên azadiyek hê mezintir.  
Ê qeşeya jin dîsan peyivî û got: Ji me re basa Awez û Hezê bike.  
Ê wî wiha bersivand:  
Pirrî caran giyanê we meydana cengê ye dema ku awezê ango aqilê û  
ponijên we  
li hember hez û xwestekên we di şer de ne. Xwezî min bikariya di giyanê  
we de  
bibûma aşîçêker û min bikariya nakokî û dijberiyên we di we de bikirana  
lihevkin. Lê ma ez ê çawa bikarim wisan bikim eger hûn bi xwe jî di dilê  
xwe ne  
aşîçêker bin û hemû taybetmendiyên xwezaya xwe nepejirînin?

Awez û xwestekên we dûmen û bawana giyanê we ne ya ku mîna keştiyan li deryayê diseyire. Eger bawan û dimenên we nexebitin, hûn dikarin tenê bi birina ba bêser bilivin an jî li nava deryayê bimînin. Çimkî eger tenê aqil desthilatdar be, ew hêzek sînorker e lê heza bêçavner û bêrêzkarî jî bi tenê pêtek agir e ku dişewite û xwe pê diruxîne. Loma bihêlin ku bila giyanê we bi awezmendî serkêşiya xwestekên we bike daku xwestekên rojane bi dilxweşî hilbikevin, mîna balinde Fênîks ji xweliyê. Hêvî dikim ku hûn li aqil û xwestekên xwe wisan binerin mîna ku ew du mêvanên li mala we bin. Bêguman hûn naxwazin hurmet û giramiyê bidin yekî û yek din bê qedir û qîmetê bihêlin. Çimkî ew, ê ku kesekî ji yê din baştir dihesibîne, evîn û baweriya herduyan jî ji dest dide. Dema hûn li çiyayan li bin sîbera spîndarên spî rûdinin û hûn ji aşî û aramî û zelaliya mêrg û zeviyên dûr zewqê distînin, bihêlin dilên we di bédengiyê de bipeyivin: "Yezdan bînvedanê xwe di aqil de dike." Ê dema bahoz bê û bayek pihêt daristanê vebiweşîne û gurmîna birûskan hêzdarî û gewreyiya esman

rabighîne, bihêlin bila dilê we di tirsaxwe de bibêje: "Yezdan di coşê de dilive."

Û ji ber ku tu bi xwe jî di mîrekiya Yezdan de nefesek î û li nav daristana Yezdan

jî pelek darê yî, divê tu jî di aqil de bîna xwe bidî û di coşê de bilivî.

Û jinek peyivî û got: Ji me re basa Êş û Janê bike.

Û wî got:

Jana we şkandina qepûşka mîdyeyê ye ku têgihîna we disitirîne, mîna ku çawa

divê qepûşka fêkî jî bişkê daku kakil û dilê wê tavê bibîne, divê hûn jî wisan fêrî

êş- û jankişandinê bibin. Û eger dilê we bikare ji sosretiyên rojane fam bike, êş

û jana we jî dê ne ji kêfxweşiya we kêmtir an zêdetir sosret û perçoyî be.

Û hûn

dê demsalên dilê xwe jî mîna wan demsalan, ên ku bi ser zeviyên we de tîn,

pêşwaz bikin û bipejirînin. Û hûn dê bi aramiyek bêdeng li zivistana janên xwe

temaşê bikira.

Pirraniya jana xwe we bi xwe bijartiyê. Jan vexwarinek tal e ku nojdar û hekîmê

di we bi xwe de veşartî eziya xwe ya nesax pê sax dike. Ji ber wê yekê baweriyê

bi nojdarê xwe bînin û dermanê wî bi bêdengî û bi aramî vebixwin: çimkî destê

wî, tevî ku giran û req e jî, di bin serkêşiya destê nazenîn destê yê Nedîtî de ye. Û

ew qedeha ew tîne, tevî ku lêvên te bişewitîne jî, ew ji bekreyê, ya ku  
Cerçêker bi  
ronikên xwe yên pîroz şil kiriye, hatiye çêkirin.  
Û zelamekî got: Ji me re basa Xwenasînê bike.  
Û wî wiha bersivand:  
Dilên we di bédengiyê de di nihînên şev û rojan digihin. Lê guhên we tî e  
ji bo  
ku bikarin dengê zanîna dilê we bizanin. Hûn dixwazin wan tiştan, ên ku  
we  
hertim bi raman zanîne, bi gotin jî bizanin. Hûn dixwazin bi tiliyên xwe  
dest  
bikin bedena tazî ya xewnên xwe.  
Baş e ku hûn van tiştan dixwazin. Divê dilê kaniyên veşartî yên giyanê we  
rabibin  
û bi xwişînî ber bi oqyanûsê de biherikin. Û gencîneyên kûriya we ya  
bêpayan dê  
li ber çavên we vebibin. Bi ti pîvan gencîneya xwe ya kûr nepîvin çimkî  
nava we  
deryaya bêpîv û bêsinor e.  
Nebêjin: "Min rastî dîtiye" lê çêtir: "Min rastiye." Nebêjin: "Min  
rêya  
giyan dîtiye." Baştir e ku hûn bibêjin: "Ez li ser rêya xwe pêrgî giyanê  
hatime."  
Çimkî giyan li ser hemû rêyan dimeşe. Giyan ne tenê li ser rêyekê dimeşe  
û  
mîna qamîş jî şên nabe. Giyan mîna gula lotus bi bêhejmar pelan vedibe.  
Paşî mamosteyekî got: Ji me re basa Fêrkinê bike.  
Û wî got:



Ji bilî wan tiştan, ên ku di berbanga zanîna we de nîv-raketî ne, kesek  
nikare  
tişteki ji we re derbibe û îfade bike. Mamoste, yê ku li ber sîbera ayîngehê  
bi  
şagirt û mirûdên xwe re ye, tişteki ji awezmendiya xwe nade wan lê ji  
bawerî û  
hezkirina xwe didiyê. Çimki eger ew bi rastî jî awezmend û aqilmend be,  
ew ê  
wan bang neke xanîkê xwe lê baştir e ku rêberiya wan bike daku ew  
bigihin  
derazînk û şipaneyê giyanê xwe. Stêrnas dikare baweriya xwe ya li  
hember valahî  
û fezayê ji we re rabighîne lê ew nikare têgihîn û famdariya xwe bide we.  
Muzîkjen dikare ji we re awazên erd û esmanan bistre lê ew nikare guhekî  
bide  
we ku hûn wan awazan tê de biparêzin an jî dengekî bide we ku bibe olan  
û  
dengvedana wan awazan. Ê jimarnas dikare ji we re basa cîhana pîvan û  
wezinandinê bike lê ew nikare we bigihîne wir çimki bînahiya kesekî  
nikare baskan  
bide yek din. Ê çawa ku her kes ji we di zanîna Yezdan de tenak û cuda  
ye, divê  
wisan her yek ji we bi xwe jî bi awa û şeweyek xwe yê taybet Yezdan fam  
bike û  
tê bigihe.  
Ê xortekî got: Ji me re basa Hevaltiyê bike.  
Ê wî wiha bersiv da:

Hevalê te bersiva pêwîstiyên te ye. Hevalê te zevî ye ku tu bi evînî ditovînî  
û bi  
spasdarî didirûyî. Ew mase û argûna te ye çimkî tu birçî tê nik wî û jê  
aramiyê  
dipêyî.  
Eger hevalê te helwesta xwe diyar bike, tu natirsî bibêjî "na" û "belê" jî  
negotî  
nahêlî. Ê dema ew bêdeng û bêpêjn jî be, dilê te dê her jî guhdarê dilê wî  
be  
çimkî di navbera hevalan de hemû raman, hemû hêvî, hemû daxwaz  
diafirin û ew  
bê xwestin û bêrêkirina çepikan jî li hev tên belavkirin. Eger ji hevalê xwe  
vebiqetî  
jî, tu dê xemgîn nebî çimkî ew tişt, a ku tu di wî de herî zêde jê hez dikî,  
dikare di  
neamadeyiya wî de hê jî zelaltir bixwiye, mîna ku çawa li deştan çiya ji  
kesên  
hilkev re hê zelaltir dixwiye. Bila ji te re tenak armanca hevaltîyê kûrkirina  
giyanê  
be. Çimkî hezkirin, a ku ji bilî xwiyabûna xwe li tiştê din digere, ne  
hezkirin e lê  
torrek e ku hatiye avêtin: û tenê yê bînirx dê bikeviyê. Ê tiştê herî baş ji  
xwe  
bide hevalê xwe. Eger pêdivî ye ku ew bi daketina ava giyanê te bihese,  
bihêle ku  
ew rabûna wê jî binase. Divê tu li hevalê xwe negerî tenê ji bo ku dema  
xwe ya

vala derbas bikî. Di kêlîkên jiyantijî de bi wî re be çimkî erkê wî ne  
dagirtina  
valatiya te lê verevandina bêrîkirina te ye. Û di şîrîniya hevaltiyê de bila  
ken û  
kêfxweşiya hevbeş hebe çimkî bi şilbûna spêdeyan a tiştikên biçûk dil  
berbanga  
xwe dibîne û terr dibe.  
Û dû re zanayekî got: Ji Peyivînê biaxivin.  
Û wî got:  
Hûn hingê dipeyivin dema ku ramanên we bîna xwe nadin. Dema hûn êdî  
nikarin  
di bêdengiya dilê xwe de bin, hûn bi lêvên xwe dijîn, û deng ji we re kêf  
û  
herwiha derbaskirina dem e. Û di pîrraniya peyivîna we de raman bi nîvî  
tên  
kuştin çimkî raman balindeya valahiyê ye ku di rekeha peyvan de baskên  
xwe  
belav dike lê nikare bifire.  
Di nav we de kesên wisan hene ku ji ber tîrsa bêkesiya xwe li kesên têraxiv  
digerin. Bêdengiya tenêti û bêkesiyê tazîtiya wan nîşanî wan dide, û ew  
dixwazin  
jê birevin. Hin kesên wisan jî hene ku bê zanîn û ponijîn dipeyivin û rastiye  
tînin  
ziman lê bê ku ew bi xwe jî tê bigihin. Û yên wisan jî hene ku rastî di dilê  
wan de  
ye lê bi gotin nabêjin. Di sînga yên wisan de can di bêdengiyek biawaz de  
dijî.

Dema tu li ser rêyê yan jî li bazargehê hevalê xwe bibînî, bihêle ku canê te lêvên  
te bilivîne û serkêşî û rêberiya zimanê te bike. Bihêle ku dengê te de ji guhê wî re  
bipeyive çimkî canê wî rastiya dilê te diparêze mîna ku çawa em çêj û tama meyê  
ji bîr nakin tevî ku reng ji bîr bûne û aman nemabe jî.  
Û stêrnasekî got: Mamoste, tu ji Demê çi dibêjî?  
Û wî besivand:  
Hûn dixwazin ku demê bipîvin lê ew bêpîv û bêsinor e. Hûn dixwazin ku saet û  
demsal rêbaza canê we bi xwe û ta pêşketina giyanê we jî bipîvin û bihesibînin.  
Hûn dixwazin demê bikin herikek ku li ber rûbinin û li darêjîna herikê binerin.  
Lê dîsan jî bêdemiya di we de ji bêdemiya jiyanê haydar e. Û canê we dizane ku  
do tenê bîranîna îro û sibe jî xewna îro ye. Û ew yek, a ku hê di we de distre û  
diponije, ew e ku li ser sinorê bîsk û kêlîka pêşîn, dema stêr li valahî û fezayê  
hatine belav- û pelatekirin, de dijî. Ma kî heye hest pê neke ku evîna wî bêsinor  
e? Û dîsan jî, ma kî hest pê nake ku ev evîn, tevî ku bêsinor e jî, di nava wî bi  
xwe de hatiye girtin û ew nikare ji ramanên evîne bilebite ramanên evînek û ji

kirinên evînê bilive nav hin kirinên nû yên evînê? Û ma dem jî her mîna evînê  
ne wisan e ku nayê beşkirin û bêşop e? Lê eger hûn hewcedariyê bibînin  
ku divê  
dem li ser demsalan bê beşandin, bihêlin ku her demsalekê di nav  
hevêrke û  
çemera xwe de demsalên din jî hebin. Û bihêlin ku ev roj bi bîranîna dema  
raborî û bêrîkirina dema bê wan bihemêzîne.  
Û yekî ji nav mezinên bajar got: Ji me re basa Qencî û Xerabiyê bike.  
Û wî bersiv da:  
Dikarim ji qenciya di we de bipeyivim lê nikarim ji xerabiya di we de çimkî  
ma  
xerabî ji bilî qenciya bi birç û tîniya wê êşandî zêdetir çi ye? Bi sond, dema  
qencî  
birçî be, ew ji şkeftên tarî jî li xwarinê digere û dema ew tî be, ava genî jî  
vedixwe.  
Dema hûn bi xwe re ahengdar bin, hingê hûn qenc in. Lê eger hûn  
bêaheng jî  
bin, dîsan jî hûn ne xerab in çimkî xanîkê beşkirî ne hêlîna dizan e; ew  
tenê  
hatiye beşandin. Û keştî dikare bê dimen jî di ber giravokan re bimeşe bê  
ku  
binoqe. Dema hûn didin xwe ku hûn tişteki ji xwe bidin hin ên din, hûn  
hingê  
rind in. Lê eger hûn li berjewendiyên xwe bigerin jî, dîsan jî hûn ne xerab  
in  
çimkî dema hûn li qezenca xwe digerin, hûn mîna wan reh û rîşan in ên  
ku xwe

radiheşînin nav erdê ji bo ku bersînga erdê bimêjin. Fêkî nikare ji reh û rîş  
re  
bibêje: "Tu jî mîna min be, gihayî û têrtijî û ji adanî û bereketa xwe li yê  
din  
bibexîşîne." Çimkî, çawa ku rîş ji bo wergirtinê hatiye afirandin, erka fêkî  
jî dan  
e.  
Dema hûn di axivîna xwe de tam şiyar in, hûn rind in. Lê dema hûn  
dixewin û  
zimanê we bê armanc tev digere û dihilingive jî, hûn dîsan jî ne xerab in  
çimkî  
ta axivîna hilingivok jî dikare zimanê qels û lawaz xurt bike.  
Dema hûn bêşewiş û bi gavên wêrek û biste ber bi armanca xwe de  
dimeşin,  
hûn rind in. Lê tevî ku hûn kulek jî bigerin, hûn ne xerab in çimkî kulek jî  
paşde  
nameşin. Lê hûn ên lezgîn û xurt li pêşiya yê lingşkestî xwe nekulînin û  
wê  
yekê wek hevalbendiyê nehesibînin.  
Hûn bi bêhejmar şêweyan rind in lê eger hûn ne rind bin jî, hûn ne xerab  
in. Hûn  
tenê gevende û toranî, keslan û temel in. Mixabin ku xezal nikarin lez û  
bezayiyê  
fêrî kotiran bikin.  
Rindiya we di bêrîkirina bicîanîna eziya we ya gewre de ye: û ev bêrîkirin  
di we  
hemûyan de heye. Lê di hinan ji we de ev bêrîkirin mîna herikekê ye ku  
di

meşîna xwe ya ber bi deryayê de bi hêz dixwişe û bi xwe re nihînên çiyayan û

stranên daristanan diqelizîne. Û di hinên din de ew herikek sawî û rastgehî ye ku

bi zivirokandina xwe, xwe wenda dike û hêdîka digihe beravê. Yê ku bêrîkirin li nik pirr e, nabe ji yê bêrîkirin li cem kêr re bibêje: "Tu çima hêdî û biguman î.?"

Çimkî ew, ê ku bi rastî jî rind be, ji yê tazî re nabêje: "Ka cilên te?" û ji yê bêmal re jî nabêje: "Ka xaniyê te?"

Dû re qeşeneyekê got: Ji me re basa Lavakirinê bike.

Û wî bersiv da:

Di dema xemgînî û welweleya xwe de hûn dua û lavayan dikin. Xwezî we di rojên xwe yên dilşad û têrtijî de jî wisan bikira.

Ma lava ji bilî vekirina kûraniya nava we ber bi valahiya jîndar de zêdetir çî ye?

Û eger dawêşandina xemgîniyê ber bi valahiyê de xemên we vebirevîne, dawêşandina berbanga dilê we jî dê ji we re dilxweşiyê bîne. Û eger hûn tenê hingê bikarin bigirîn dema ku giyan we bangî lava û nivêjan dike, divê ew her û her piştevaniya we bike, bila bi ronikbarandinê jî be, ta ku hûn bikarin dîsan bikenin. Dema hûn lavayan dikin, hûn ê hilbikevin jor û pêrgî wan hemû kesan bîn ku di heman demê de lavayan dikin û ku we dê ji bilî di nivêjan de ti caran nikariya bi wan re bîn cem hev. Loma herin ayîngeha nebîn, hema bila tenê ji bo hindê jî ku hûn bikarin ji ber dîtî û pêrgîhatina hezkerên xwe bigeşin û kêfxweş bibin çimkî eger hûn tenê ji bo xwestekan bikevin ayîngehê, tiştekek dê ji we re neyê dan. Û eger hûn bikevin navê daku hûn xwe rûreş bikin, hûn ê neyên serbilindkirin. Û eger hûn bikevin hundur tenê ji bo ku ji aliyê hin ên din ve lavayan bikin, hingê

jî dê li we neyê guhdarîkirin. Lê tenê ku hûn bikevin ayîngeha nebîn, bi serê xwe bes e.

Nikarim fêrî we bikim ka divê hûn çawa lavayan bikin. Yezdan guh nade gotinên we eger Ew bi xwe wan bi lêvên we neîne ziman. Û ez nikarim we bielimînim lavayên deryayan, daristanan û çiyayan. Lê hûn, ên ku li çiyayan û deryayê û li nav daristanan welidîne, dikarin lavayên wan di dilê xwe de bibînin. Û eger tenê hûn di bêdengiya şevê de guhdariya wan bikin, hûn ê bibihîzin ku ew bê peyv diaxivin: "Yezdanê me, tu, yê ku kûriya nava me ya bibask î, tenê vîn û îradeya te di me de bi cî tê çimkî daxwazên Te di me de dijîn. Hêza Te şevên me, yên ku yên Te bi xwe ne, dike roj ên ku ew jî yên Te ne. Em nikarin ji Te tiştekî hêvî bikin çimkî Tu bi xwe bêrîkirinên me dinasî hê ji berî ku ew di me de çêbûbin jî çimkî Tu bêrîkirina me yî, û bi hê jî dana xwe Tu hemûyê didî me."

Hingê xamoşanek (mirovrevek, tenêperestek), ê ku salê tenê carekê dihat nav bajar, derket pêş û got: Ji me re basa Şahiyê bike.

Û wî wiha bersivand:

Şahî strana azadiyê ye lê ew ne azadî bi xwe ye. Ew hêviyên we yên mîna gulên bişkivî ne lê ne mîna fêkiyê wan e. Ew kûriyek e ku bangî ber bi bilindiyê de dike

lê ew bi xwe ne kûrî û ne jî bilindî ye. Ew tiştek rekehkirî ye ku bask jê re tîn dan lê ew ne valahiyek sînorkirî ye. Belê, bi rastî jî, şahî strana azadiyê ye. Û xwezî we bikariya bi her awayî ji dil wê bistrin lê xwezî hûn dilê xwe bi strînê ji dest nedin.

Hin xort û ciwan li pey şahiyê ne mîna ku ew her tişt be, û ew tîn darizandin û lomandin. Lê ez bi xwe ne wan didarizînim û ne jî dilomînim; hêvî dikim ku ew lê bigerin çimkî ew şahiyê dibînin lê ne tenê wê. Şahiyê heft xwişk hene, û ya herî kêr jî ji şahiyê bi xwe bedewtir e. Ma we



nebihîstiye ku zelamekî erd kolî ji bo ku reh û rîşan bibîne lê gencîne û  
xezîne dîtî?

Û hin ji we salmendan bi poşmanî, mîna wan xerabiyên, ên ku bi sermestî  
kirine, şahiyên xwe bi bîr tînin. Poşmanî mijandin û ewrandina lê ne  
mezinandina dil e.

Çawa ku ew bi spasdarî li ser dexl û danê havînê dayî diramin, divê ew  
wisan zewq û şahiyên xwe jî bi bîr bînin. Lê dîsan jî, eger poşmanbûn ji  
wan re

xemrevîn be, bila xemên xwe pê birevînin.

Di nav we de hin kes hene ku ne tîr xort û ciwan in ku li şahiyên bigerin  
û ne jî

tîr pîr in ku wan bi bîr bînin. Û ji ber tîrsa lêgerîn û bibîranînê ew ji hemû  
zewq û

şahiyên direvin daku dev ji canê xwe bernedin yan jî wî aciz nekin. Lê  
redandin û

defandina şahiyên û revîna ji wan bi serê xwe ji wan kesan re şahî ye. Û  
ew jî dê

her gencîneyê bibînin tevî ku bi destên lerizok jî reh û rîşan dikolin. Lê ji  
min re

bibêjin ma kî dikare can û giyanê aciz bike. Ma bilbil dikare bédengiya  
şevê yan jî

agirmêş stêran aciz bikin? Û ma agir an jî dûkêlê we dikare ji ba re bibe  
barek

giran? Ma hûn bawer dikin ku giyanê avê genî ye ku dikare bi gopal bê  
şêliyandin?

Pirî caran, ku hûn şahiyên diredînin û didefînin, hûn tenê xwestekên xwe  
diheşînin kûratiyên nihînî yê canê xwe. Ma kî dizane ku sibe dê li benda  
tiştên îro

nekirî hatî hiştin be? Bedenên we jî mîrat û xwestekên xwe yê mafdayî  
dinase û  
naxwaze ew jê bîn stendin. Ê bedena we çeng û centûra canê we ye.  
Hûn dikarin  
pê hem awazên xweşaheng û hem jî yê bêaheng derbixin.  
Ê niha hûn ê di dilê xwe de bipirsin: "Ma em ji ku dizanin ka kîjan zewq û  
şahî baş  
û kîjan jî ne baş in?" Herin nav zevî û baxçeyên xwe û hûn dê bibînin ku  
mêşa  
hingiv ji bo kêfa dilê xwe hingiv berhev dike. Lê gul jî bi kêfxweşî hingiv li  
mêşê  
dibexişîne çimkî gul ji bo mêşê kaniya jiyane ye. Ê mêş ji bo gulê  
peyambara  
evîne ye. Ê ji herduyan re, hem ji gulê û hem jî ji mêşê re zewq û şahiya  
dan û  
wergirtinê hem pêwîstî û hem jî jihalçûn e. Ey gelê Orfaleseyê, di şahiyên  
xwe de  
mîna gul û hingivmêşan bin.  
Ê helbestvanekî got: Ji me re basa Bedewiyê bike.  
Ê wî bersiv da:  
Ma eger bedewî bi xwe ne rêbaz û rêberê we be, hûn ê li kû lê bigerin û  
ji kû  
bînin? Ê ma eger bedewiyê bi xwe axivîna we nehûnandiya, we dê çawa  
bikariya  
ji bedewiyê bipeyivin?  
Yê xembar û acizbûyî dibêje: "Bedewî dostane û nazenîn e." Bedewî,  
mîna ku

dayikek hê ciwan be, dema di nav wan de digere, ji ezîziya xwe nîv-şerm dike. Yê azwer û muhterîs dibêje: "Na, bedewî hêz û tirs e. Mîna bahozê ew erdê di bin piyên me de û esman li ser serên me dihejîne." Yê westî û betilî dibêje: "Bedewî pistînek dengnizm e. Ew di canê me de dipeyive. Dengê wê di bêdengiya me de mîna ronahiyek kêmhêz e ku ji tirsê siyê direcife." Yê nearam dibêje: "Me dengê wê li nav çiyayan bihîstiye. Ê dengê wê çeprepa siman, pîrrîna baskên balindeyan û orrîna şêran bi xwe re tîne." Bi şevê zêrevan û dergevanên bajar dibêjin: "Bi berbanga spêdeyê re bedewî ji rojhilat hiltê." Ê nîvrojê karker û gerrok dibêjin: "Me dîtiye ku bedewiyê ji pencereyên rojavabûnê xwe bi aliyê erdê de tewandiye. Zivistanê yê berfê berbendkirî dibêje: "Bedewî dê bi çargavî li ser zinaran biharê bê." Ê di gurmijiya havînê de yê dextl û dan didirûn dibêjin: "Me dîtiye ku bedewî bi pelên darên payizê ve direqise û hildipirre û me berf di nav pirça wê re dîtiye." We ev hemû tişt ji bedewiyê gotine. Lê dîsan jî hûn ne ji bedewiyê lê ji hêviyên vemirî û bicînehatî dipeyivin. Bedewî ne xwestek lê jihalçûn e. Ew ne devê tî û ne

jî destê vala, yê dirêjkirî ye lê zêdetir dilek çirûskar û giyanek kêfxweşîker  
e. Ew

ne wêneyek e ku hûn bixwazin bibînin û ne jî stranek e ku hûn bixwazin  
bibihîzin.

Lê ew mîna wêneyekê ye ku eger hûn çavên xwe bimiçînin jî, hûn ê  
bibînin û

stranek e ku eger hûn guhên xwe bimismidînin jî, hûn ê dîsan jî bibihîzin.

Ew ne

benîştekek di qalikên kivloşkî û qurmiçkî yên daran de ye û ne jî baskek bi  
nînokan

ve girêdayî ye. Lê ew mîna baxekê herdem gulbişkivî û komek firîşteyan,  
a ku

herdem difirre û dipirre, ye.

Ey gelê Orfaleseyê, dema ku jiyan perdeyê ji ser rûyê xwe yê pîroz radike,  
ew

bedew e. Lê hûn bi xwe hem jiyan û hem jî perde ne. Jiyan abadînî ye ku  
di

neynik û awêneyê re li xwe dinere. Lê hûn bi xwe abadînî û neynik in.

Û qeşeyek pîr got: Ji me re basa Olê bike.

Û wî bersivand:

Ma min îro basa tiştekek din kiriye? Ma ne hemû kar û ponijîn bi xwe ol e?  
Û

hemû tiştên din jî, yên ku ne kirin û ponijîn lê heyirîn û suprîz in jî û yên  
ku di

giyanê de dilivin dema ku dest hê keviran dipelixînin an qumaş  
ditevinînin? Ma

kî dikare baweriya xwe ji kirinên xwe û bîreweriya xwe jî ji karê xwe  
vebiqetîne

û cuda bike? Ma kî dikare saetên dema xwe ji hev belav bike û bibêje: "Ev  
ji  
Yezdan û jî ji min bi xwe re. Ev ji giyan û ev jî ji bedena min re."? Hemû  
saetên  
dema we bask in ku di valahiyê de ji ba we difirin ba hin ên din. Yê ku ji  
we  
rewişt û exlaqê xwe wek baştirîn perdeya xwe hildigire, çêtir dibû ku ew  
tazî  
bigeriya. Ba û tav dê qulan di laşê wî de nekunînin. Ê ew kes, ê ku tevger  
û  
radana xwe li gor rewîşt û exlaq bisînor dike, ew strana balindeyan di  
rekehê de  
berbend dike. Dengê strana herî azad jî ji pişt torr û şîfşeyên rekehê  
hilnakeve.  
Ê ew, ê ku ayîndariya wî li ber pencereyekê ye, ku dikare vebibe û bê  
girtin, ew  
kes hê neketiye kûriya navenda giyanê xwe ku pencereyên wê hertim ji  
berbangekê ta berbangek din vekirî ne.  
Jiyana te ya rojane ayîngeh û ola te ye. Hûn kengî bixwazin bikevin navê,  
her  
tiştê xwe bi xwe re bibinê. Hevcarr, kargeh, merdan, çekûç û gêzikên xwe  
bi  
xwe re bibinê. Hemû tiştên we ji bo pêwîstî û daxwaziya jiyana xwe  
afirandine  
bi xwe re bibinê çimkî di xewn û xeyalên xwe de hûn nikarin ji baştirîn  
bidestxistiyên xwe bilindtir hilbikevin û ne jî ji biserneketîtirîn têkoşanên  
xwe

nizmtir dabikevin. Ê her kesî bi xwe re bibin: çimkî di ayîndarîkirina xwe de hûn nikarin ji hêviyên wan bilindtir bifirin û ne jî ji bêhêvîtiyên wan zêdetir xwe serşorr bikin.

Ê tevî ku eger hûn bikarin Yezdan binasin jî, tê nekoşin ku hemû mamik û têderxistinokan çareser bikin. Baştir e ku hûn li dor xwe binerin û bibînin ku Ew bi zarokên we re dilîze. Ê li esmanan binerin: hûn dê bibînin ku Ew di nav ewran de dimeşe û bi vejenîna birûskan destên xwe dirêj dike û di dema barîna baranê de wan berejêr dike. Hûn dikarin bibînin ku Ew di gulan re dibîşire û dû re hildikeve û destên xwe ji nav daran dihejîne.

Paşî Almitra wiha peyivî: Em dixwazin niha ji te basa Mirinê bipirsin.

Ê wî got:

Hûn dixwazin nihîna mirinê bizanin. Lê ma eger hûn ji dilê jiyane li wê negerin, hûn ê çawa wê bibînin? Lê kund, a ku çavên wê yên şevê girêdayî bi rojê kor in, nikare nihîna ronahiyê zelal û averû bike. Eger hûn bi rastî jî dixwazin giyanê mirinê bibînin, dilê xwe li ber xurtiya jiyane vebikin û fire bikin çimkî, çawa ku çem û derya her yek in, wisan jiyane û mirin jî yek in.

Di kûriya hêvî- û bêrîkirina we de haydariyek bêdeng li ser wê yekê heye ku çi li

pişt van hemû tiştan e. Û mîna tovê di bin berfê ve, dilê we jî di xewn û xeyalên biharê de ye. Ji xewn û xeyalan bawer bikin çimkî derî û rêya abadînê û herheriyê di nav wan de ye.

Tirsa we ya ji mirinê mîna recifîna şivanekî ye ku li hember padişayê xwe rawestî dema ku padişa destê xwe datîne ser kulovanka serê wî. Ma şivan di recifîna xwe de jî ne bextewar e dema ku ew dikare bexşîşa padişayê xwe hilbigire? Ma ew ne dîsan jî hê zêdetir ji recifîna xwe haydar e? Çimkî ma mirin ji bilî rawestîna wek tazî li ber ba û helîna li ber tavê zêdetir tişteke heye? Ma xelasbûna nefeskişandinê ji bilî azadbûna ji lidorzivirîna wê û hilketina wê û mezinbûn û bi azadî gerîna li Yezdan zêdetir çi ye?

Tenê dema ku hûn ji herika bêdengiyê vebixwin, hûn ê bi rastî bikarin bistrin. Û dema ku hûn gihabin gupika çiya jî, hûn ê dîsan jî bikarin hilbikevin. Û dema ku erd endamên laşê we bixwaze, hingê hûn dikarin bi rastî bireqisin. Û êdî bûbû êvar.

Û Almitraya pêşbîn got: Bila ev roj, ev cî û giyanê te yê peyivî pîroz bin. Û wî got: Ez peyivîm? Ma ez ne herwiha guhdar jî bûm.

Paşî ew bi pêpelûkên ayîngehê de daket û gel da pey wî. Ew hilket keştiyê û li

ser dewang û qepaxa wê rawestî. Wî dîsan berê xwe de gel, dengê xwe  
bilind  
kir û got: Ey gelê Orfaleseyê, ba bangî min dike ku we bi cî bihêlim. Ba ji  
min  
dilxwaztir e ku biçê lê dîsan jî divê ez herim. Em gerrok, ên ku bi abadînî  
li  
rêyên bêkes û tenê digerin, em roja xwe ji wê derê dest pê nakin ku roja  
berî  
wê lê xelas bûye û rojhilatin jî nikare me li ciyê rojavabûnê em lê hiştî  
bibîne.  
Ta di xewa xwe de jî em dimeşin û digerin. Em tovê nebat û şenkatiyên  
di erdê  
re rîşgirtî ne, û dema ku dilê me bigihe û tijî bibe, me didin ba daku ba  
me  
biperritîne û belav bike.  
Kurt bûn ew roj ên ku min bi we re borandin û ji wan hê jî kurttir bûn ew  
gotin ên  
ku min ji we re lêvandin. Lê eger dengê min di guhên we de bêpêjn bibe  
û evîna  
min ji nav bîranînên we bifirike, ez ê dîsan vebigerim. Dixwazim bi dilek  
dewlemendtir ji we re biaxivim daku baştir bikarim Giyanê bi lêvên xwe  
şîrove  
bikim. Belê, ez ê bi hilketin û daketina ava deryayê re vebigerim. Tevî ku  
mirin  
min vebişêre û bêdengiyek hê jî mezintir min rabipêçe, dîsan jî dixwazim  
li  
têgihîna we bigerim. û lêgerîna min jî ne bêşûd e. Û eger min tiştek, a ku  
rast e,



gotibe, ew rastî dê hê zelaltir bi wan gotinan, ên ku zêdetir nêzî ramanên  
we ne,  
diyar bibin. Ez ê bi ba re bimeşim, ey gelê Orfaleseyê lê ez ê nekevim  
valatîyê. Û  
eger ev roj ne roja bicîhatina hêvî û evîna we bûbe, bila ew destûr be ji  
bo rojek  
nû. Daxwaz û bêrîkirinên mirov diguherin lê ne evîna wî û ne jî hêviya wî  
ku evîn  
bêrîkirina wî têr bike. Loma bizanin ku ez ê ji valatîyek hê mezintir bigihim  
vir.  
Mij, a ku berbang diruxîne û tenê wek xunavan dixê nav zeviyan,  
hildikeve, digihe hev, dibe ewr û dû re wek baranê datê xwar. Ez mîna  
mijê bûme. Di bêdengiya şevê de ez li kuçe û kolanên we gerîme û giyana  
min ketiye hundurê xanîkên we.  
Lêdan û qutên dilên we di dilê min de bûn, nefeskişandina we li ser rûyê  
min bû û min hûn hemû dinasîn. Belê, min xweşî û nexweşiyên we dinasîn  
û xewn û  
xeyalên we xewn û xeyalên min jî bûn. Pirrî caran ez li nik we bûm, mîna  
deryaçeyek di navbera çiyayan de be. Gupik, nişîv û kendalên we û  
herwiha  
raman û hêviyên we jî di min re diteyisîn. Kenê zarokên we mîna robaran  
û  
bêrîkirina xort û ciwanên we jî mîna çeman dihatin bêdengiya min. Û  
dema ew  
digihan kûriya min jî, dîsan jî robar û çeman dev ji strîna xwe bernedida.  
Lê tişteke hê ji kenê we şîrîntir û ji bêrîkirina we mezintir dihat cem min.  
Ew

bêsînortiya di we de bû. Giyanek mezin ku hûn tenê hucre û betanên wî ne. Ew ê ku di strana Wî de strîna we tenê qutînek bêpêjn a dil e. Hûn bêsînor di

bêsînortiyê de ne. Ê bi dîtina Wî min hûn jî dîtina û min hûn evandin çimkî ma evîn dikare bigihe dûrî û dîstansên di vê valahiya bêsînor de tine? Ma çi bînahî, çi hêvî, çi bisteyî dikare ji firrîna evînê bilindtir hilbikeve? Bêsînortî di giyanên we de mîna gûzek gewre ya tijî kulîlkên li ber bişxivînê ye. Hêza Wî we bi erdê ve girê dide, bîna Wî ya biheştî we radike ber perrên esmanan û xweragiriya Wî we dike nemir.

Ji we re hatiye gotin ku hûn mîna qelstirîn xirxalê zincîrê qels in. Ev yek tenê nîv

rastî ye. Hûn herwiha bi qasî bihêztirîn xirxalê xwe bihêz in. Pîvana we li gor

biçûktirîn kirina we mîna wê yekê ye ku hêza oqyanûsê wek kefa piş bê hesibandin. Mehkûm- û desteserkirina we li gor bisernektinek we mîna wê yekê

ye ku ji ber guherîn û cudayiya demsalan gazin û lome li wan bînin kirin.

Belê, hûn mîna oqyanûsê ne. Ê tevî ku keştiyên li meyavgehê mayî li qeraxan

rabûna avê dipên, ne hûn û ne jî oqyanûs dikare di rabûna wê de bilezîne.

Ê hûn

herwiha mîna demsalan in jî. Ê tevî ku hûn zivistanê rê nedin biharê, ew bihar, a

ku di xewê de bi we dibişire, aciz nabe û dê her bê.

Nefikirin ku ez vê yekê ji we re dibêjim daku hûn jî ji hev re bibêjin: "Wî em

pesinandin. Wî tenê rindî di me de dît." Ez tenê wan tiştan, ên ku hûn bi xwe di

ramanên xwe de dizanin ku rast in, ji we re dibêjim. Û ma zanîn jî ji bilî  
siya  
zanîna bêdeng çi ye? Ramanên we û peyvên min tenê pêlek bîranîna  
zeximandî  
ne ku rojên me yê do, serdemên berê ku hê erdê ne em û ne jî xwe  
dinasî û ji  
wan şevan dema ku erd hat afirandin û şikilandin, bîranînan tomar û  
tescîl dike.  
Peyayên awezmend hatine ku awezmendî û aqilemendiya xwe fêrî we  
bikin lê ez  
hatim ku awezmendiyê ji we fêr bibim: Û binerin, min tiştêk dîtiye ku ji  
awezmendiyê jî mezintir e. Min giyanek agirîn di we de dîtiye ku bi  
berdewamî li  
xwe digere di wê demê de ku hûn, bê ku ji mezinbûna wê haydar bibin,  
gazinan  
dikin ku rojên we virtîvala û xirpîxalî firikîne û ji dest we derketine. Jiyan,  
a ku li  
jiyana bedenî digere, ji gorrê ditirse.  
Li vir gorr nîn in. Ev deşt û zozan dergûşan û kevirên liserdanîna gavan in.  
Hûn  
kengî di ber wê meydanê, ya ku bavkalên we lê hatine binaxkirin, re  
derbas bibin, bi seqbêrî û dîqqet lê binerin û hûn ê bibînin ku we û  
zarokên xwe lê govend girê daye. Bi sond, hûn gelek caran kêfxweş in bê  
ku hûn bizanin jî. Hin kes hatine cem we û we dewlemendî û desthilatî,  
şan û şoret dayiyê çimkî we ji sozên wan ên zêrîn bawer kiriye. Min qet  
sozek jî nedaye we lê dîsan jî hûn ji min re hê jî merdtir bûne. We tînîtiyek  
hê kêr a jiyanê daye min. Bêguman e ku diyariyek ji wê mezintir nîn e ku  
armancên mirov bibin lêvên tînî û jiyan jî bibe kanî. Û ev yek xelat û helata

min e. Çi gava ku bê m ser kaniyê ji bo ku vebixwim, pê dihesim ku di  
rastiyê de av bi xwe tînî ye. Û dema ez wê vedixwim, ew jî min vedixwe.  
Hin kesan ji we ez gelekî pozbilind û zêde şermîn hesabandime ku  
diyariyan ji we  
bigirim. Bi rastî jî ez pozbilind im ku meaş ji we bigirim lê ne diyariyan. Û  
tevî ku,  
di demekê de ku we dixwest ez bi we re li ser sifreyê rûbinim, min li çol û  
çiyayan  
giya û fêkî dixwar, û di demekê de ku we dê bi dilgermî û kêfxweşî  
bikirama  
mêvanê xwe, ez li ber stûnên ayîngehê radizam, ma dîsan jî ne ew  
xwedîlêderketina we ye ku xwarina min biçêj û şîrîn kiriye û şevên min  
têrxew  
kirine?  
Ji ber vê yekê ez dixwazim we bipîrozînim:  
Hûn gelekî didin lê qet nizanin ku didin. Bi sond hevaltî, ya ku di neynikê  
re  
fedike xwe, dibe kevir. Û kirinên baş, ên ku xwe bi navên bedew  
dipesinînin,  
dibin kaniya xezebê.  
Hin kesan ji we ez wek xerîb û dûrmîrov hesabandime ku di efsûna tenêti  
û  
bêkesiya xwe de digirim. Û we gotiye: "Ew ne bi mirovan re lê bi darên  
daristanê  
re danûstandinan dike. Ew li gupika çiyayan rûdine û çavên xwe li bajarê  
me  
digerîne." Rast e ku ez bi çiyayan ve hilketime û li deverên dûr gerîme. Lê  
ma

eger min ji dûr û bilind li we neneriya, min ê çawa hûn bidîtana? Ma eger mirov

ne dûr be, çawa dikare bi rastî jî nêz be?

Lê hin ên din, tevî ku bê peyv jî be, li min qîrîne û gotiye: "Xerîbo, xerîbo, tu, yê

ku ji bilindiyên neberdest hez dikî, çima li gupikên çiya dijî ku baz hêlînên xwe lê

çêdikin? Çima li wan tiştan digêrî yê ku nikarî bi dest bixî? Ma tu dixwazî ba û

bahozê bigirî torra xwe? Û tu li pey çî balindeyên mijê yî? Were û yek ji me be.

Dabikeve jêr û birça xwe bi nanê me û tînîtiya xwe jî bi meya me bişkîne." Ew di

bêkesiya giyanên xwe de wiha dipeyivin. Eger tenêti û bêkesiya wan kûrtir bûya,

wan ê bizaniya ku ez tenê li nihîna dilşadî û xemgîniya we digirim. Û ez tenê li

eziya we ya baştir, ku li ber perrên esmanan dimeşe, digirim.

Lê hin kes nêçîra nêçîrvan jî dikin çimkî min di beza xwe de gelek ji tîrên xwe ji

kevana xwe vejenandin ji bo ku pê sîngê xwe bipijikînim. Yê ku bifire, divê herwiha li ser dest û piyan biçarlepe jî çimkî dema ku baskên min li ber rojê

vekirî û pankirî bûn, siya wan li erdê dibû kotir. Û min, ku bawer dikir, herwiha

guman jî dikir çimkî min pirrî caran tiliyên xwe kirine birînên xwe jî lê min zêdetir ji we bawer dikir û min ê di derbarê we zêdetir tişt bizanîna.

Û bi zanîn û bawerkirinê ez vê yekê dibêjim. Hûn di bedena xwe de nehatine  
berbendkirin û ne jî di xaniyê xwe ve û li nav zeviyên xwe hatine bisînorkirin.  
Eziya we ya rastîn li çiyayan dijî û bi ba re digere. Ew ji bo ku xwe bigerimîne li  
ber tavê naxwişe û ji bo penayê jî erdê nakunîne. Lê ew giyanek azad e ku erdê  
diniximîne û li ber perrên esmanan digere.  
Eger gotinên min şêlî û nezalal bin, tê nekoşin ku wan şîrove bikin. Hemû destpêk  
lê ne dawî şêlî û mijî ne. Û hêvîdar im ku hûn min wek destpêkê bihesibînin.  
Jiyan, hemû jiyan di mij û krîstalê ango belûrê de hatiye veşartin. Û ma kî dizane,  
ka krîstal jî ne tenê mijek vebûyî ye.  
Hêvî dikim ku, dema hûn li min bifikirin, ev yek bê bîra we. Her tişt, a ku di we de  
qels û wendabûyî dixwiye, bihêztirîn û bêhejtirîn e. Ma ne nefesa we hestiyên we  
zeximandine û reqandine? Û ma ne xewnê, ya ku nayê bîra kesekî ji we, bajarê  
we ava kiriye û her tiştê lê heyî çêkiriye? Eger we bînanîn û bînbirin bidîtana, we  
dê tiştekin din nedîta. Û eger we bikariya pistîna xewê bibihîsta, we dê tiştekin din  
nebihîsta.

Lê hûn ne dibînin û ne jî dibihîzin, û wisan baş e. Destên perdeya ji ser rûyê we rabikin, dê her ew kes bin ku ew bi destên xwe raçandiye. Û heman tilî, yên ku bekreya guhên we mismidandî çêkirine, dê ji ser guhên we bipeqînin. Û hûn ê bikarin bibînin. Û hûn ê bikarin bibihîzin. Lê dîsan jî hûn ê xemgîn nebin ji ber ku hûn berî hingê kor bûn û hûn ê poşman jî nebin ku hûn berî hingê kerr bûn çimkî wê rojê hûn ê fêrî mebestên nihînî yên her tiştî bibin. Û hûn ê tarîtiyê jî mîna ronahiyê bipîrozînin.

Piştî van gotinan wî li dor xwe nerî û dît ku ajotvanê keştiya wî carinan li baberikê û carinan jî li dûriyê dinere. Û wî got: Baldirêj, zêde jî baldirêj e kaptanê keştiya min. Ba dipife û bawanên keştiyê bi nearamî dipirrin. Dimen dixwaze bi rê bikeve.

Lê dîsan jî kaptan bi aramî li benda bêdengiya min e. Û hemû deryavanên min, ên ku stranên deryayên hê gewretir bihîstine, wan jî bi sebr û aramî li min guhdañî kiriye. Niha divê ew êdî hew bipên û bisekinin. Ez amade me. Herik gihaye deryayê û dîsan jî dayik kurê xwe dide hemêza xwe.

Bi xatirê te, gelê Orfaleseyê. Ev roj ava bûye. Ew deriyê xwe digire, mîna ku çawa

gula hengku jî roja xwe ya sibê di xwe de vedişêre. Çi niha ji me re hatibe dan,  
ew ê ji me re be. Û eger ew ne bes be, divê em dîsan pêrgî hev bîn, hev bibînin û  
em bi hev re destê xwe ber bi danvan de dirêj bikin. Ji bîr nekin ku ez ê dîsan jî  
bêm nik we. Tenê bîskek pêwîst e ji bo ku bêrîkirina min axê û kefê ji bo bedenek  
nû peyda bike. Tenê kêlîkek, çavmiçek bînvedanê di hemêza ba de û dayikek nû  
dê min biwelidîne.  
Hûn hemû û xortaniya min, a ku min bi we re borandiye, di xêr û xweşiyê de  
bimînin. Me do hevdu di xewê de dîtin. Hûn di tenêtî û bêkesiya min de ji min re  
strîne û min jî barûyek ta ber ewran ji bêrîkirina we ava kiriye. Lê niha xewa we  
xelas bûye, xewn nemaye û êdî berbanga spêdeyê jî nîn e. Nîvro hatiye û şiyarbûna me bûye rojek tijî, û divê em niha ji hev vebiqetin. Lê eger di şêlîtiya  
bîranînên xwe de em hê carek din jî bikarin hevdu bibînin, em dikarin ji hev re  
bipeyivin û hûn ê ji min re stranek kûrtir bistrin. Û eger di xewnê de destên me  
pêrgî hev bîn, em ê dîsan barûyek ta ber ewran ava bikin.  
Piştî van gotinan wî hêma û îşaret da deryavanan, wan jî singê keşiyê rakir,



werîs û bizîng jê vekirin û keştî hêdîka ber bi rojhilat de meşî. Ê gel bi yek deng

diqîrrî û qîrra wan ji deryayê hildiket û mîna dengê trombonê bi ser deryayê diket.

Tenê Almitra bédeng bû û li keştiyê dinerî ta ku ew di nav mijê de wenda bû. Ê

dema ku gel belav bûbû, ew hê jî li hindava deryayê bû û gotinên peyamber li

bîra wê bûn: "Tenê kêlîkek, çavmiçek bînvedanê di hemêza ba de û dayikek nû dê min biwelidîne."

\*\*

## PILINDIR

Pîr Rustem

P I L I N D I R

kurteçîrrok

- 1 -

Pîr Rustem

P I L I N D I R

Şahiya Bejî di Jiyana Solekê de

kurteçîrrok

kurteçîrrok

- 2 -

Careke din...

Jê re.

kurteçîrrok

- 3 -

kurteçîrrok

- 4 -

Pîr RUSTEM

Di sala 1963 an de li gundê Çeqela; gundekî Efrînêye ji başûrê biçûk, ji dayîk dibe. Ew çend salên pêşîn li wir dimîne û di dû re mala xwe bar bajarokê Cindirêsê dikin û heya ku xwendina lîsê kuta dike li wir dimîne û ji bo xwendina bilind di zanîngeha Helebê de, ew çend salan li wir derbas dike, lê ji berî ku xwendina endezyariyê kuta bike û di rêza çaran de berdide. Wî gelek çêrok û gotar di rojname û kovarên Kurdî de belavkirine wek: Stêr, Pirs, Zanîn, Aso, A. Welat, J. kurteçîrrok

- 5 -

Rewlên, Armanc, Newroz.. hwd. û heya bi nuha çar berhemên wî yên çêrokan hatine weşîn, ew jî evin:

-1Çivîkên Beravêtî – Çêrok, ji weşanên kovara Aso ye, Bêrût-1992.

-2Pilindir – Çêrok, ji weşanên kovara Aso ye, Bêrût– .1993

-3Pûtvan – Çêrok, ji weşanên Merxê ye, Bêrût–1998.

-4Tîrav – çêrok, ji weşanên Merxê ye, Bêrût-2000, û çapa duyemîn Sipîrêz-2002, Duhok,

kurteçîrrok

- 6 -

XWARINA DAWÎ

-Hesoyê Elo.

-Haaa.. aw, rê bidin me birano, Heso weke avjaniyekî dest pêşde têvedan, da ku riya xwe, di nav candekên karkeran re, biqelşîne. Ewî carekê ev têveda,

carekê ewê din, li dawiya-dawî, ew ghişte ber belitikê.

-Te navê xwe nebihîst, ev bû ketjmêreke ez bang li te dikim, eger her yek hewqasî bixweze, da ku bighe cem me, ji vir û heyvekê emê nikaribin mehiya we belav bikin.

-Ezbenî, ma tu nabînî çawa li seriyê hev civîne, çawa dixwezî yek zû bighe we.

-Bese.. bese, ew ne karê min e, ha ji te re pereyên te û pişta xwe pêş min ke. Ji dest wî girtin û ji nuh ve dest bi têvedanê kir.

“ -Sed du-sed.. hezar û sed û panzde dirav û heftê û pênc quriş. Maşelah heya quruşên me jî naxwin”. Pere dijmartin, bi wan mijûl bûbû, xwe jibîrve kir û li dîrakê kurteçîrrok

- 7 -

telefonê vepekî, sixêfin gotin û meşî, raman û rewşa wî rabûne hev; şerekî dijwar di navbera wan de digere. Heso pere birin, ev raste, lê ji berî ku di dest xwe ke, ji beriyê firîne û nuha pê dirame ewê çawa bibe; rewşa wî jê dixwaze evan pereyan tev li xwe û zar-zîçên xwe bide, lê eger nuha kesî ji dendarên xwe nebîne, sedîsed, piştî çend katijmêran ewê bên deriyê wî bikutin. Zarok jî li mal li hêviya wî ne, mirov di xwestekên wan de dixeniqe, bi çavin şikestî li xwe meyzekir, dilê wî bi wî şewitî; cil ew ewin.. ên kar û cejna ne û hîne êşa ser êşan, gava pîreka wî tê bal û bîra wî; “çi gunehên wê hene ku, di xizanî û perîşaniyê de bijî. Eger min nikarîbû rewşek baş jê re peyda bikira, min çima ew ji mala bavê

anî û.”..

-Selam û elêkum, roj-baş birê Heso.

-Ji yê gotî re jî. Lê ewî di hinava xwe de: “wey ne rûyê xêrê be.”

-Tu çawayî, şalê bi xêrî.

“ -Wan daye dû min, heya li cihê kar jî ez ji wan xelas nabim”. Xêr ji ku heye bavê Misto.

-Weke dibînim we mehiya xwe standiye.

kurteçîrrok

- 8 -

-Belê, mixabin.. min dênê te bi derengî xist. Du roj bi ser soza wan ketibûn.

-Em birane, kesên hevin. Lê wek tu dizanî mehî heya nîvê heyvê naçe, eger ku destê min ne tengba min ne dixwestin.

“ -Seg-bav, ji min re peyva mehiyê dike, ma çiyê te jê heye”. Kesê bi Heso re ketî ser rê, yekî ji ewan kesên bi nav û denge ku, karên fayîzê dike; ew serekê sundoqa fabrîkeyekê ye û mehiya wî ji ya Heso ne zêdetire, lê bûye xwedî milyonan. Wek dibêjin: bi peran dilîze û yeke ji ewan kesên ku, evan nîşanan bi rûyê dîkanên xwe dixînin; “ev mal û mewal ji dayîna Xwedaye”, “Qîm û bawerî, kenzekê zêrîne.”

-Bavê Misto, bigir ji te re pên-sed dirav û nîvê din, heyvê bê ezê bidime te.

-Birayê Heso, min heysed bi hezarî da te û bi sozê mehekê, eger dixwezî perên mane mehê tê bidî, divê tu şe-sidî bidî, ne pênsidî.

-Ez razîme; “gelo, ma ti rê dî li pêş min hene, dê tev

wilo bixwezin, eger ku kesî bibînim û pera bi dên bide min.”

kurteçîrrok

- 9 -

Heso; kesekî nîv bajariye; salên wî di çelî de ne, rûdêm hişk û sertin, candek dareke sindyanê ya ziwaye, por reş û simbêlan bi tamamî dev girtî; teyr û çivîk dikarin li ser binên, awir û tîrêjên wan çavên hunguvîn, tirsê di dilê yekî de diweşînin.

Piştî çend zukakên “Çayê SEYDO”, ewên bi geniya kehrîz û gemara malan, ku mîna cok û rûbaran di zukakên wê re diherikin, têtin nasîn, derbazkirin, wî derî vekir û bi qels û giranî kete hewşê. Dengê mirovekî ku, bi pîreka wî re diaxive, ji hundir ve hat û ewî zanî ku, ew jî ji dëndara ye. Li wan guhdarîkir, dît ku ewî bi pîrekê dide fêmkirin ku, wî pere bi derengî xistine. Heso dizanî ku, kesên pere dane wî, dê bên jê bixwazin, lê bawer ne dikir ku, ew wilo bilez bên; “xêre na.. nuha serê mehê ye û tev dizanin ku, ji bilî van rojan, pere li cem min ne tên dîtin.”

-Êvara te xweş be Mihme.

-Xweştir Heso. Mêvan vegerand û ew rabû ser xwe.

-Keremke rûne.. rûne, tu çawayî, bi kêfî? Bi gotinên xwe re çayek ji pîreka xwe xwest, zaroyên te çawane.

-Destên te maçî dikin. Birayê Heso, ma ji mirovê perîşan re kêf ji ku heye.

kurteçîrrok

- 10 -

-Raste; bi serê zaroyên min, ji sibê heye êvarê,

weke tu dibînî, dixebitim û dîsan jî yek nikare pariyê nan peydake, kêmasiyên min biborîn cîran, ez gelkî ji we bi fedî me.. . Xecê kanî çayê. Heso ji babetekê hildipekî yeke din, nedizanî çi bigota; bi serîkî dive perên wî bidêyê û bi seriyê dî, dive ewan pereyan li mal xerc bike.

-Na, naxwaze.. bi Xwedê ez bi lezim.

-Çawa bê çayê ji cem min rabî, ev çê nabe; “ya te jî raste, ji peran pêve tiştekî din naxwazî”. Heso dizane ku, ew dixweze bilez pereyên xwe bibe û here. Lê da ku hinekî xwe ji bîr ve bikin, careke din, li pîreka xwe kire qêrîn û xwesteka xwe dubare kir; weke ku ewê bi evê derengiyê karibe evê pirsgirêka xwe çareser bike. Lê gava çavên wî bi ling û kabokên mêvên ketin, dît ku ew li ser hev ranawestin; bawer nake kengî pereyên xwe bistîne, ewî di hinava xwe de got.

“ -Ev lawê zindiya evqasî tirsîye ku, ez pereyên wî bixum”. Cîran tu razî dibî ku, ez niha sê-sidî bidime te û du-sedî din meha bê.

kurteçîrrok

- 11 -

-Ez nikarim, bi Xwedê ku di dest min de heba min hew ji te bixwesta. Piştî ku, wî pereyên xwe birin rabû çû, bêyî ku li benda çayê bimîne û ne jî Heso ji wî dixweze ku, ew bimîne. Bi anîna çayê re çavên wî bi rûdêmê Xecê ketin, zer-miçiqîne û candek hiliyaye, ji bilî çerm û hestiyên nemaye.

Roja şahiya wan hat bîrê; “ax.. ax ji wan rojan re

keçê, tu çiqas xweşik û ciwan bû di wan rojan de, bi dêmê xweyî sorgulî te ez serxwoş dikirim, min ji bilî êş û perîşanî ti tişt bi te neda nasîn, me ti roj bi gewzî bi hev re neqedand.. û zarok, çima te evqas dev ji min re vekirin.. bi Xwedê ev cihê te ye, kê ji te re got evqas zaroyan bîne, ma te ew ji mala bavê xwe anîn, ew jî şaşiya min bû. Lê mafê min hebû, keçê min çawa xwe bigrta; demên ku te xwe li pêş min tazî dikir, te buhşt tanî ber lingên min.. çawa nekevîmê.”

Ewî çav ji pîreka xwe berdan û avêtin ser koma zarokan; zikên tazî û werimî û riwên bi hebên salê aşlekirî”. Xwedêyo, te çima ev êş tev kiriye para min, tu erzaqan belav dikî, çi gunehên min û van hene.

Xwedayê erd û ezmanan, tu Xwedayê berberî..

kurteçîrrok

- 12 -

wekhevî, dad û berberiya te kanî. Belê, ew bi derî û dîwarên dîkan û salonên berberan ve hatiye bidardakirin, mîxkirin û piştî vê tu dixwezî bawer bikim ku, tu dilovanî, bese.. . Hêdî-hêdî, çawa tu yê dilovan bî û tu Xwedayê erd û ezmanan. Ev gewc; bavê Misto û ji vî bajarî wek dibêjin: ji deve guh ne yê wî ye, bihina dilovaniyê jê nayê, dê çawa ji te bê û tu Xwedayê gerdûnê teve, hey to.. laa.. z. Na, eger çiqas tolazî û pîsîtî heye, ji te de dest pê dike û li cem bavê Misto dawiya xwe dibîne, rê nenir ku xivranê ji te bixwezim, piçekî din emê bi hemberî hevkevin.. di qirkên hev kevin û qîma min tê ku, tu ne tiştî.. belê ne tiştî û bi carekê

derew û çewtebaweriya bi hebûna te, ji jîn-derewa me  
tê û baweriya bi te, serkêşiya derewên ku em pêketine  
ye. Belê.. belê, me tu afirand.. ji tirs û qelsiya me, tu hat  
û piştî wê, em ji tirsaxwe tirsîn, li pêş qelsiya xwe em  
qels ketin û bûn koleyên kesê ku, me bi destên xwe  
afirandibû û me nikarî çewt-baweriya xwe aşkere bikira.  
Lê na, ez ne koleyê te me û ezê anuha ji te re bidim  
xûyanî ku, ez ne koleyê te me.”

kurteçîrrok

- 13 -

-Leylê kanî çeto. Bi dengê pîreka xwe re, ji pêjin û  
xeyalan hate girtin.

-Nizanim? Keçik ji nuh ve vegeriya lîskên xwe, wê  
dixwast bûkeke paçî ji xwe re çêbike, lê di dest wê de  
paçik di şeliyan, berve bavê xwe zîvirî û got: bavo..  
bûkekê ji min re bîne.

-Ev ji min kêmbû. Bi gum-gumî wî vegerand.

-Tu his nabî, bi wê bûkê xwe bilîze. Dayê jê re got;  
wê rewşa mêrê xwe dizanî, ewqas salin kulfetê hevin û  
demên êş û şahiyên mêrê xwe nasdike, bêyî ku ew jê re  
bi peyve.

-Bûkekê ji min re bikin? Bû ting-tinga wê.

-Ezî hatim te, nuha dema bûk û giriyê te ye. Bi  
gotinên xwe re gihêşt nik keça xwe û yek şeqam lê  
şidandin. dema giriyê wê zêde bû. hêrsê wê jî rabû..  
kulm û şeqam germkirin û qêrîna wan, mal û cihên vala  
tijî kirin.

-Qîza kûçika, yek nikare ji dest te li mal rûne, eger



ku tu wilo dikarî li zaroyan bidî, ez jî dikarim li te bidim.  
Ma ne bese, xwe li pêş segên fabrîkê di melisînim, li  
mal jî dixwazî wilobim? Kule-mistine pola vewşandin ser  
kurteçîrrok

- 14 -

newqa Xecê û di pişt re, çend pan û şeqam jî gihandinê.  
Rû li Xecê zerbû û lêv li ser hev ranawestî, di çavan de  
tîrsa dîrokiye; ewa ku ji bav û bira de mayî.. tîrsa ji  
xwediyên simbêlên boq.

Dema dît ku, lepên wî di xwînê de sorbûn, dev jê  
berda û bê ku, li wê vegere, dev da derî û derket. Bi rê  
de rastî zaroyekî xwe hat, şeqamek pêve da, ji ser riya  
xwe da alî û kete zukakê. Bê dost û heval, bê Xweda,  
xwe bi tena xwe di cîhanek vala de dît.

Ba di êvarên zivistanê de û li aliyê bakur ji Sûryê mîna  
devên kêraye, dev û lêvên mirov diqusînin. Yek kêr ji ewî  
bayî xwarin; “ez çî mirovekî tolaz û gewcim, belê ne tiştim..  
kêz û kurm jî dikarin pariyên nan bibînin. Ji xeynî wêranê ji  
min nayê.. dive yên weke min nemînin.. xelk ji wan xelas be,  
derman çiyê.. . Mixabin Xecê, li min bibore, bes.. bes te hêşt  
ku, hêrsê min rabe. Belê, çima hûn min bi tenê nahêlin, dev ji  
min berdin, divê ez tola xwe ji jîrî vedim, ji vê ser êşê  
derêm”. Ew dikeve dermangeha yekemîn ku, li pêş xwe  
dibîne, dêst davêje beriyê û di nav tiliyên xwe de, ewan çend  
qurûşên ku ji mehiyê mane misdide.

-Dermanî mişkan li cem te heye.

kurteçîrrok

- 15 -

-Ango zihêrê mişkan. Xwediyê dermangehê  
vegrand.

-Zihêre.. dermane wek heve.

-Ê reş heye, ew pir kêskine, divê tu hajî zarokan  
hebî.

-Ne xeme.. dê pir baş be, ewê têra tevan bike. Kanî  
du tûran bide min.

-Çima dudiwan, yek bese ku hemû mişkên Helebê  
bikuje.

-Çiyê te jî heye, tu dikarî peryên xwe bixwezî.

-Tu çima wilo tirş û sertî, nayê xwestin tu wilo dengê  
xwe li min bilind bikî.. bigire.

Herdu tûr kirin dest xwe û ji hundirê dermangehê  
derket, baweriya wî hîne zêde bû ku, ev jiyana ne ji  
kesên wek wî re ye; “ew jî segekî wek xeynî xweye, dev  
ji hev kirî û didan tûjin, goşt jî kefnikiye. Pêpelokî û wilo  
ji Xwedê de pêpelok daketine, ax.. ax bes nuha bêjiyek  
di dest min keta û bihata ji min re wilo bigota, ku min  
fûte ji serî bavêta, biqopirandina. Pêpelokî.. ji qerezê te  
re ez kê yekê hilweşînim”. Wî serî hilda û li kûraniya  
ezmên meyzekir, tu yê bibêjî ku ew û Xweda li hember  
kurteçîrrok

- 16 -

hev, weke du dîkan, du kesên rêzanyar û her yek ji  
partiyêke kurdî, rawstîne û rabûne ser çogan, her kes  
dixweze ya xwe bibe serî û bi serxîne. Lingê Heso bi  
ber kevirekî ket û vepekî, bi tijî dengê xwe bang li  
Xweda kir û bi sixêf û xeberan bi wî û pêximberan ket,

kale-mêrekî xeberên wî bihîstin, destên xwe bi ezman de hilda û dilovanî ji yê jor xwest.

-Tu hîne dike fix-fix. Xecê dengê xwe birî û dema wê bihîst ku, ew çêra xwarinê dike, ew rabû çû, da ku sifrê amede bike. Bi rêve deng li kurukê xwe kir ku, ji derve werê û xwarinê buxe. Lê dema ku şer di mal de hebe û dê digrî, dev bi xwîn û por li serî hinc û qij be, bav jî rûtal û tirş, ma zaro dikarin xwarinê buxun. Çawa dê bi gewriya wanda here.. zu-qûme, zihêra reşe û ez hêsirên xwe jî didim ewan kesên ku, jiyana xwe wilo diqedînin. Gava Xecê çû. Heso jî da dû, da ku, herê zihêrê bihelîne.

-Te çi xwarin ji me re çêkirî. Heso pirsî, lê bêyî bipirsê jî ewî dizanî ku, xwarina her roj e.

. . . -Deng bi Xecê neket.

-Tu kerî. Bi hêrs gotê.

kurteçîrrok

- 17 -

-Te nedîtiye, şorbe-nîske.

-Çima zaro tev nehatine, bihêl û here deng li wan ke.

-Kengî birçîbûn ewê werin buxun.

-Vî serî hişk êkê nerm nebe, tu min nasnakî, min got here yanê here. Bi ustu-xwariya ku, ji dê û dêpîran girtî derket û Heso jî, “derman”ê xwe derxist û dest bi karê bijîjkiyê kir, piçek neçû, tev li dora sifrê. “Xwsrina Dawî” rû.. niş.. ti.. bûn.

Heleb, 88.

kurteçîrrok

- 18 -

TOL

-Xelo, laaa.. aw Xelo. Ev Ibilîsa bi ku ve çû. Dengê wê di ser xaniyên gund re difirî, lê kurê wê bi xwe û lîstika guleyan de ketî; ro hatiye nîvro û ew hîne birçîbû û dema dayîka wî dît banga wê bê sûdeye, ji mal bi derket, da ku here bi guhên wî bigire, çend şeqaman pêvede û bîne mal.

-Tifî li vî ziblî; Yek nikare cihekî paqij bibîne û lê bilîze.

-Tifî li vî gundî, evê wêran. Ji bilî keran yek nikare ti tiştî din lê bibîne. Demê ku ez mezin bibim ezê dev jê berdim û birevim bajêr.. rast tu jî bi min re naçî. Ax ji bajêr Xelo û ji wan keçên bi pantiron. Gava hevpeyvîna wan gihêşt sira keçikan, bi pis-pis, bi hev re dipeyvin û çend caran li heldora xwe dizîvirin. Xelo.. ax ji qelîşteken pantironên wan, yek dixweze wan bi gezan kurteçîrrok

- 19 -

buxe û heya hestiyar jî ji segan re nehêle. Êho bi dil şewatî peyvên xwe davêje guhên Xelo.

-Bi du bostan bilîze. Xelo got.

-Na, bi du bost û çar tiliyan.

-Ê di.. . Xelo sixêfek gote hevalê xwe. Ezê Piçekî guleyê xwe bi şûnde bidim û bi du bost û çar tiliyan bilîze? Wî gule bi şûnda da.

-Hey min di.. . Êho xwe guvaşt, sixêfek got û gule avêt. Hat.. . Wî xwe li ber berda ser çogan, da ku bipêve

û tiliyên xwe ji hev kişandin. Bostik, du-du.. hi.. hi.. . Ji nihve dipêve.

-Hêy hê....y. tu yê tiliyên xwe daterşînî, lê tu yê nikaribî lê bînî. Êho bi fen û fûtan digel meziniya temenê xwe karîbû ya xwe bi ser xista û ji Xelo re bigota ku, pîvana wî lê hat.

-Ha ji tera, ji vê sibê de tu ketî dû min, da ku ji min bistînî. Xelo dirava nazdar ji beriya xwe derxit û berve Êho dirêj kir û got: Bigre.

-Kanî, kanî. Bi lez û weke roviyê seriyê mirîşkan dibîne, ji dest wî girt. Imm.. m. Dirav maçkir. Iff.. f, ev çî kurteçîrrok

- 20 -

bihne; kî dizane te ew ji kengî ve di dest xwe de girtî û tu wê misdidî. Xelo reng da.

-Xelo.. kero, ji kingî ve bang dikim, hey wêran bi te keto, tu hatiye û bi vî segî re dilîzî. Diya Xelo gihêştibû ba wan.

-Devê xwe bigire ha, ez zanim çî dibêjim. Êho got.

-Quzul-qurt, ez şimikê deynim, ezê pêncî li na çavên te xînim, yela bicihenim here mal, Hîn diya Xelo gotinên xwe bi serî nekiribûn. Êho gihêştibû aliyê gund ê dî.

-Tu jî jê nemayî, demê em dibên here kurmê zêtûna bi kuj, tu dimirî û dibêjî: “bi Xwedê ez nikarim, ez nexweşim û hezar derdî tu bi xwe dixî”. Lê ji lîskê re tu weke gurî. Bi gotinên xwe re şeqamek gihand kepira Xelo û bû qîr-qîra wî.

-Ay, aa.. ay. Dengê girî bilind bû. Nuha bavê minê

were, ku min jê re negot.

-Hîn dixweze ji bav re bêje ku wî çikirî. Gotin û giriyê wî bê ber û sûde bûn; hîne lêdan zêdekir, dawiya dawî ghiştin mal.

-Zû bilezîn û here ka û cihenî têxîn pêşiya kerê û wan karikan; ji vê sibê de te tişt ne dayî wî dewarî.  
kurteçîrrok

- 21 -

-Ez narim, tu li min xîne û hîne herim ji te re kerê êmkim.

-Te got çî, tu narî. Xelo naskir der bive ne, lewra pîspîs ling xuşandin, zembîl kir destê xwe û ber bi maxê çû.

-Tu çî dikî cinawir, bi lez zembîlê deyne pêş kerê û here mala Îbiş û bêjingê bîne.

-Uff.. fî. ... . Piştî zembîl danî, xwest here mal Êho û ji nuh ve pêre bilîze, belkî dirava xwe vejerîne. Lê çûndina mala Îbiş hate bîra wî û ji tirsê lêdan û kulmistan re, pêle dilê xwe kir, hîne piştî wî gerim û sore; yek dibêje qey agir li ser piştê pêxistine. Ew bi ramanên xwe ve kete hewşa Îbiş.

-Xalê Îbiş. Fat bi dengê wî re derket; hevsal û hevala wî ya lîskêye, nemaze di demên ku, bi hev re diçin ber dewêr.

-Tu çî dixwezî. Bavê min ne li male.

-Diya min got here bêjingê bîne.

-Piçekê li vir raweste, da ku ji te re bînim. Ew bi dawiya gotina xwe re, di reşiya hundir de, winda bû.

Xelo her roj bi Fatê re dilîze, lê ti caran weke nuha nedît kurteçîrrok

- 22 -

ku, ew dixweze bi destên wê bigre. Ew di nav bera du gotinan de bûbû mêr; axavtina Êho pêre, hate bîrê.

-Bigir bibe? Bêjing ber bi wî dirêj kir. Xelo dest avêtinê, lê nizanî ber bi kê dirêj kir û wî gotinên xwe jî ne bihîstin, lê piştî demekê jê re gotin ku, te jê re got bû: “tu nabî jina min.”

-Yala ji vir, bila diyê te we bike? Ew bêjingê hiltîne, da ku ramanên Xelo di seriyê wî de biceliqîne. Lê ji berî ku, bêjing bi ser seriyê wî de bête xwar ew direve, bêyî ku bêjingê bibe û vegere mal; çawa ewê vegere û diya wî dê jê ne pirse: kanî bêjing, çima te nanî.

Xelo di rê û zukakên gund re, di ber malên axî..

wêrankirî re dimeşe.. dilîze, carekê kevirekî radike û di segî cîranan werdike, dibe gewt-gewta wî, careke din şeqamekê li zarokî ji xwe bi çûktir dixîne, qêrîniyê pê dixîne û ji berî ku, diya zaro bibîne, ew direve: “uff.. fî çî germe”. Wî demeke dirêj bi lîskê Qedand, daxwaza wî ku dizê xwe; Êho bibîne. Ji dûr ve wî dibîne.

-Êho were.. min tu girt; emkê lîskê xwe bi serî bikin.

-Perê te hene lê, na.

-Demê te vexwar mexaz perên xwe.

kurteçîrrok

- 23 -

-Ji ku, ez bi ê wek te re nalîzim.

-Ji ku tînim, ne îşê te ye. Were em kê bilîzin. Xelo

xwe hinekî sert kir.

-Ez ê xwe bi yekî miflis re nalîzim. Êho gotina xwe got û berê xwe guherî, xwest here çihêkî din, belkî zarokêkî bibîne û eger diya wî ew şandibe dikanê, ew keysa wî ye ku, ew awa xwe bike. Gava Xelo naskir ku, dirava wî bû xewne-roj, li Êho kir qêrîn.

-Tê wek keran bilîze.

-Çi.. çi, bi zorê û wek keran. Ber bi hev hatin, bi pan û kulmistan rabûn hev, di ser hev re tolbûn, di toz û axê de gevizîn û piştî ku, westiyan dev ji hev berdan. Dema wan şer fikir, şerekî din li gund, di nav bere diya Fatê û Xelo de, lidarketibû.

-Tu hîne devî xwe jî ji hev dikî. eger tu yek bi namûs ba, teyê lawî xwe perwede kira, nema ji xeynê çêlkên bêjiyan şerên xwe di keçên comerdan bidin.

-Cîran şerme, dengê xwe bilind neke, Diya Xelo li ber ewê digere.

-Duxaze hîne husbim, bi Xwedê li ser vê yekê xewnakim.

kurteçîrrok

- 24 -

-Diya Fatê. Xelo hîne zaroye, tiştên wilo nizane, ka ji devê kê ev gotina bihîstî.

-Zaro.. dibêje zaroye. Eger ev bêjiya zaroye, çima ji Fatê re dibêje: “tu nabî jina min”. Ê ji te re nabêje. Dema cîrana ev hevpeyvîna di navbera herdu pîrekan de bîstin, him-him, kete nav wan de.

-Sitar Xwedê ev çi zemanê. Zaroyên me jî hene, bes



em negînin ewê roja ku, gotinin wilo di devê wan re derkeve û eger tiştêkî wilo di wan de bibînim, ezê. ..

-Keko tê çi bikî, ne namûs û ne jî rûmet mayî.

-Dibê şeref. bavo nemaze piştî van dibistan û tilvizyonan. dihêle yek bi riyên xwe bigre.

-Gotina Miho di cî de ye; ev xwendevanên kafirbaz tiştêkî ji dîn-diyaretê nizanin, yek ji wan bawer nake çawa keça miroekî xwe, di quncwkî de bigre û li ustiyê wê ne.

-Dema ne dibistan, ne jî xwendin hebû, şerefa gundiyan ya tevabû.

-Çi heye, tu çima van sixêfan dibêjî û ji kê re. Îbî deng li jina xwe kir û dengên cîranan birî; ew di nav gundiyan xwe de de, bi zirtî û teresiya xwe hatî nasîn. kurteçîrrok

- 25 -

Pîrtekî mêraye, rûdêm hertim li qehire, enî qujmirî, serokê qeşmeran nikare ewî berkenî bike.

-Ax ji min ser hevdê re, ez piçekê ji mal derketim û di dû min re ev bêjeya; kurê Qere hatî bêjingê û dema Fatê bi tenê li mal dibîne.. . Lê Îbiş xwe negirt û li wê kire qêrîn.

-Qîz kûçka, tu yê nuha ji min re li ser gera xwe û çêroka malbata xwe bipeyvî, çi heye? Bi gotinên xwe re carekê seriyê çov kuta sînga pîreka xwe.

-Wî dest avêtî Fatê û jê re gotî tu nabî jina min. Îbiş bi gotinên wê re weke ku, xwe di ava qestelê de bibîne, tevhev dilerize.

-Te çî got, hey min di ser.. . Eger tu yek çêba, kesî nikarî ji keça te re gotinên wilo bigotana? Wî jink da ber çov û lêdanan.

-Ax.. ax, gil-gûyî te duxum Îbiş, lo bi Xwedê ez ne li mal bûm, min bi te.. . Ji berî gotina xwe bibe serî, xwînê di dêv û bêvilan re avêt û seriyê wê bi du ciya şikand, bi ewî çovê ku, qet ji dest xwe danîne û heya demên ew radikeve jî ji pîrekê nêzîktir ji xwe ve datîne. Ax.. ax, anê kurteçîrrok

- 26 -

min rebenê çikirî. Xwedê û yarebî xwaska ligên min bişkîna û ji mal derneketama.

-Ji min re ya rast bibêje; wî bêjiyî çikirî, bi Xwedê ezê nuha te û wê dêlê.. ezê we herdiwa bigorim. Deng bi jinkê neket, wî panek vewşand newqa wê û borînî pêxist.

-Ez çî dibêjim, qîz kûçka çî çêbûye.

-Ev.. hif.. his.. hif. Firq-firqa wê ye. Xelo ewî ku, kes nizanê ji kê ye.. bavê wî kî ye.

-Ez zanim.. ezim, ji xeynî min kî heye, bila herin ji diya wî bi pirsin. ... ..

-Dest avêtî Fatê.

-Xelo.. Xelo! Ewî ku ji serî ... min ketî, hatî namûsa min, ezî ku her roj diya wî di bin xwe de dipelixînim, hîn bav-kalên me jinên wan davêtin bin xwe. Bi gotinên xwe re jinek bi panekê re avêt. Ji ser riya min bi derkev û demê vegehm, zanim çî tînim seriyê te û wê dêlkê. Dema ku pîreka Qere; diya Xelo gotinên Îbiş bihîstin,

xwest tev keçên xwe ji mal bireve; ne ji tiresa kuştin û talanê re, lê ji ber tolazî û bênamûsiya Îbiş. Lê mixabin, malbata Îbiş heldora wan giritine, ew malbata herî kurteçîrrok

- 27 -

mezine di gunde û mala Qere bi tena xwe ne, raste ev sîh salên wane ku, ew hatine evî gundî, lê bê xisimin û nikare hawarê ji tikesî bixwaze, ji bilî mêrê xwe, lê kanî Qere, ew ji berbanga sibê de li ber serê cote.

-Hêy.. hêy kuva, tu yê ji ber Îbiş kuva birevî. Ezê nuha ji te û bêjiyê te re xûyakim çawa yek jinên xeynî xwe distîne.

Malbeta Îbiş gustîlka tolaziyê li derdora wan vegiritne, ji pêş gur direve.. baz dide, zarên wê di qunceke hewşê de digrîn.. dikine hawar, lê kes dengê wan nake.. . Bi nava wê girt, avête erdê û dest avêtin paşila wê.. pêsîr jê re çirand û li ser siwar bû.

-Me tu da aliyekî û nuha yên mayî, min sînd xwerî.. bi sînda giran ku, çi mê di vê malê de hebin, ez yekê bernadim. Ew bi gotinê re bezî ser zaroyan, dev bi gilîz, dest bi xwîn û çav sor.

-Zorker vê yekê neke, ew hîne zarone û ti tiştî ji tolaziya te nizanin. Hawar gundîno, min bikujin. Qere bikujin, bes zarên min ji destê vî zorkerî derînin. Kesî bawer ne dikir ku, dengê jê derê, lê ti êşan nikarîbû kurteçîrrok

- 28 -

dengê wê, di wan kêlîkan de, bixeniqîne? Dema dît

hawarên wê bê sûde ne, hêz da xwe, lê ji nuh ve ket.  
Kesên gund didîtin, wan ev tişt didîtin, her kes li cihê xwe  
rawestiye, temaşa şerê wan dikin, kes naxwaze rola seg bibe.  
Îbiş jî guh nade temaşa wan. Bi gotinên wê re bezî ser keça  
deh salî, bi şeqên wê girt û xuşand bin xwe, qêrîn pêket..  
fixtinî ji gewriyê de hat.. . Weke wî gotibû: ewî ant û soza  
xwe anî cih; ti mê ji mal nehiştin ku, hilnepekî ser. Kesên  
gund hîne temaşa wan dikin, lê yek rastiyê bibêje;  
mirovantiya wan livî, gilîz bi devên wanî jor û jêrîn ket û her  
yekî dixwest ku, ew Îbiş ba.

Şengêlê, 88.

kurteçîrrok

- 29 -

ZIMANEKÎ ZIWA...

JI GOTINAN, JI PELAN

Derbasî hundurê xweringehê bû, lê çavên wî li şûnê  
mabûn; bi du keçikên ku di ber wî re borîbûn re, çûbûn  
û mîna du segan ketin nav lingên wan. Bi lêdana  
panekê ji sola keçekê-dûvên xwe xistin nav lingên xwe  
kurteçîrrok

- 30 -

û vegeriyan seriyê B. Osî û çend kêzik ji pêş wî  
revandin.

HIN RAMAN JI YÊN B. OSÎ

“ -Ji vê sibê de ez van kasêtan digerinim”. Wî kasête  
xweyî mozîkê yê yekem tomar kiribû, “Ez birçîme.. ! Ma  
te îro nan xistî devê xwe heya ku, tu bipirsî tu birçiyî yan  
na, ez birçîme”? Di ewê kêlîkê de çavên wî bûbûn du

cewrik û dabûn dû ewan herdu keçikan. “Ax çima te wilokir, te çima zemîn di hatina YESOE de ranewestand, çavên xwe kuva digerînim, agir û dêpî ji wan dikişin û dil ziwa dibe.”

Wî kuva dinirî didît ku, qeflên keçikan bi hev ketî, hin bi meş.. hin jî li pêş deriyên zukakan rûniştine? Taziya ku, bi bostekê di jorî kabokên wan re dibirûse, hişê B. Osî di pelixînin. “Birçîme.. û di beriya min de çend diravin, divê ez hesabê xwe û rê jî bikim, lê ji vê sibê de min titşt nexistî devê xwe û bi ser evê yekê de jî min yara xwe nedît, ma tê çawa bibînî û te yê ew bibra kuderê, kesên ku tu wan nas dikî eger fedî nekin ewê bêjin te: bes tu tê li ba me radizî, çawa hîne tu ji wan re kurteçîrrok

- 31 -

bibêjî; “dixwezim yara xwe bînim ba we û ezê hinekî bi tenê pêre bimînim”. Eger ku ew razî bibin û ev dûre, ne dûre ku cîranekî wan, ji xwedyên rihên dirêj, xeberê bide polîsê şeref-parastinê û eger ku, hûn bi hev re, di odê de bêne girtin, ma xwedyên wê yê çî bi we bikin û..”

-Tu çî dixwezî. Dengêkî hêrs kete guhên wî û çend pilindir di guhê nêvî de kizirandin, hêşt ji cihê xwe veciniqe. Dengê azanekê dihat, ji kûraniya mejî de dihat û çend gor-mezel di çavan de şînbûn û kefenekî sipî ku, hin lekeyên xwînê lê pijqîne vedirşe û bi vekirina devê şikefteke tijî kurmin zer, hinek dûpişk jê diweşin û bi wî ve didin.

-Ez ji te re ne vala me, tu çî dixwezî. Xwediye xwaringehê pirsaxwe dubare kir, ew avis bûbû ji evê sekenîna B. Osî ya bûdelî û ji ewê bêdengiya wî. Ji dema ku, ew kete hundirê xwaringehê de, hêştibû deh caran deng lê bike, lê bala wî ne lêbû û mîna kesê benckirî, çavên wî, di pencera ku li hebamberî xwaringehê de, lûs bûbûn û bêyî ku, B. Osî çavan ji ewê pencerê derîne tiliyên xwe ber bi (qursên felafil( kurteçîrrok

- 32 -

dirêjkin. Tûrê kasêtan danî ser masê, kursiyek bi şûnda kişand û gezek li sendewûşê xist, lê gir-gira segê di pencerê de, parî di qirka wî de kir kulmeke qûmê, dest avêt piyala avê û gava hilda ser lêvan dît tişteki hişk kete ser zimên û bi guvaştina didanan li ser naskir ku, kêzikek pelaxt.

Bûyera ku, evê sibê bi B. Osî re çêbûye hêştîye ew hîne sergêjokî be; piştî ku ji cem xwediye Stiryo Jîn derket û ewî ti kasêt ji dest ne girtin, li ser riya servîsê sekinî, da ku, ewana daxîne stiryoyên bajêr, di ewê hîngê de dît sê keçik ji paşîya taxa Eşrefiyê ve tîn û hêştin ku, çend salon di ber wî re biborin, bêyî ku li ewana siwar be û çî ajovanê ku, jê re zemor dîkir bi wî re dikenî, kenê xwe li pêş keçikan rêdixist, lê her ku ew nêzîk dibûn kenê wî zertir dibû û ji nav lêvan diweşiya. Bi lêdana şeqamekê ji aliyê keçîka ku, dilê xwe jê re kiribû qeyêqek, çend gangilyin sor ji pozê wî weşîn û bi alafa zimanê wê re çelmisîn. Kesên nêzîk.. dûr li seriyê wan civîn,

pir peyv herikîn, lê ti wêne di seriyê B. Osî de sayî nebûn,  
wêneya diya wî di nav dûmên û agirê (Sînemeya Amûdê) de  
winda dibe û gotinên Xweda li derdora wî belav dibin..

kurteçîrrok

- 33 -

diherikin. B. Osî dan nav xwe û bi rê de yekî xort, xwedî  
dapanc, destên xwe xistin xirtika gewriya wî û çend kulmdaxmeyên  
parastinê di ruwê wî de çandin û gava ji keçikan re  
got: ez wî bibim û bihêlim bila şîrê diya xwe ji bîr bike? Hêşt  
ew bibe bokeyê ewê meydanê û çiyên ku, li derdora ewan  
keçkan re digerîn, xwe bidin şûn. Bi danasîna xwe bi wan û  
kenekê kûnde, ji alyê keçikan de, wî destên xwe ji B. Osî  
şûştin û ji teksiyekê re hildan, her çar ji nav kesên civiyayî  
kişîn, bi ken siwar bûn.. meşîn û B. Osî di nav nirîn û  
dilmayîyan de ji bîr bû; her yekî ji yên civiyayî çend dilopin  
girîz di bin zimanê xwe de veşartin, heya ku, dighên mal û  
dihêlin sîpeyiya avisiya wan berbavêje. Bi bîranîna evê  
bûyerê re çend stêr ji çavên wî weşîn.

XEWNA B. OSÎ

Gulîstana fekûlta wêjeyî ye, ya Zanîngeha Helebê, ji  
bin tîna rokê direve ser çaterêkên nav daran de. Çi  
keçika di ba wî re dibore perçeykî ji kezeba wî dihelîne,  
pir naçe û ew mîna bablîsokan ber bi pirtûkxana  
merkezî derdikeve, lê bê meşîneke durust ji ketijmêrê,  
kurteçîrrok

- 34 -

xwe li pêş pirtûkxanê, di nav komeke keçik de, dibîne û  
kemaca ku, di hembêza xwe de daniye, davêje ber

lêngên kesên dertên û dikevin hundirê pirtûkxanê û.. di bin lingên kêzikekê de dişke.

B. Osî digel keçikekê, ji yên li derdora wî, rûniştî û bê şerm cilên xwe datînin; bala kesî ne li wane, ne ji yên rûniştî û ne jî ji yên dimeşin, keçika tazî xwe li ser piştê dirêj dike. Ji vebriqîn û birûskên ku, ji gewdê keçikê diforin, gulîlkên çavên B. Osî diherikin, bi koranî wê bihin dike, dalêse.. ziman dibe marik û li gewdê keçika tazî di-ale û gava dighe seriyê kaniyê, ew volkana di hinava wî de diteqe, davêje û diya xwe di hemêza xwe de dibîne.

#### SEG Û MIROVEK DI ÇAVÊN PÎREKEKÊ DE

Ji nuhve çavan hildide pencera li hemberî xwe, qêjînî bi dil dikeve; kesereke sar ji zimên diherike û çend çaran çavan digre û vedike, ji tîn û ronahiya ku di pencerê de, dikele.. dipijqe, dil hejmara lédanan ji bîr kurteçîrrok

- 35 -

dike; gupik hîne bi temamî di bin xunavê de venebûne û di porê wê yî şil re ku, dilopên avê jê, hêdî-hêdî, di bin çena wê re û ber bi sîng.. herdu memikan ve diherikin, naskir ku, çavên baranê hertim li xakêye. Di ewê hîngê de, B. Osî xwest wênekêşek ba, da ku, karîba wêne û rawestîna wê ya di pencerê de û herikandina perdê bi ser herdû milên wê yî teze de û ew segê di nav tiliyan de, bigirta? Gava xwest seg jî têxîne hundir wêneya giştî, çavên wî li yên seg dikevin û dibe gir-gira wî û didan di nirînên wî de diçin xwarê çavên xwe ji yên seg



dibire û ber bi yê n keçîkê dişîne, bi dîtina kenê zer li ser  
lêvên wê, keçîka evê sibê ewa ku, dil jê re kiribû  
qeyêqek, di çavên wî de, şîn dibe û hin gol xwînê ji riwê  
masa li pêş derdibin.

Rahişt tûrê kasêtan, pişt xûz ji devê xwaringehê  
derket, giraniya nirînên seg û keçîkê li ser piştê ye, çend  
gav avêtin û ghişt kenîştta Mar Butros, hundir zikê wî  
şewitî û tûrê kasêtan ji nav tiliyan dişemite, her çendek li  
aliyekî dikevin û dengê terqiniya wan di bin solên  
rêwîyan de tê. Hunava wî dikele û kela verîşiyê di dêv û  
bêvlên wî re davêje, gol-gol belav dibe; golin tijî kenê  
kurteçîrrok

- 36 -

lêv û dev, pozin reng-rengî, por û memikin bê şîr û hin  
çavin tijî kîn û dilxwazî, di nav wan de kêz di xil-xilin, li  
ser dijîn, diwerimin û dikevin nav zukakên bajêr, dikan û  
kenîşt-mizkeftan. Dibin xwedî gotin, yek ji ewan kurmên  
ser reş ber bi B. Osî ve tê û ewî dike du par, yekî dixe  
devê xwe û parê din jî ber bi kêzîka ku, pêra dimeşî dirêj  
dike û di hundir devê wê yî bi (mikyac) de winda dibe.

Heleb-93

kurteçîrrok

- 37 -

QE!!..

Xwe şîlf-tazî rûniştî li bin darekê dît û bê ku, ji rewşa  
xwe şerm bike, radibe ser xwe; heya-heya nirînên wê difirin  
valahiyê. Beyabaneke rût û leylane, çend caran çavan  
misdide, da ku evê xewna kabûsî jê biweşîne, lê her ku li dor

xwe dizîvire, çavên wê bi bablîsokên ji toz û qûmê, bi komên qoq-hestiyên mirovan dikevin. Ji nuh ve rûdinê û bêyî ku, tirs riya dilê wê nas bike, xwe li bin dara hişk û bê av, dirêj dike. Kore-marekî jî xwe li koka darê alandî û yek dilopên aveke zer ji ser zimanê wî dadirivin ser memikên wê, li şiqinên darê yên jor jî, çend kevokên sipî nîştine û di dev wan de tiliyên zaroyin teze dipirpitin.

kurteçîrrok

- 38 -

Û gava teq-req dikeve guhên Zêneba Beko, ew xwe rast dike, dibîne ku ji nav komekê, ji yên hestiyên, pûtheastiyê zarokê radibe ser piyan û ber bi wê ve têtê û bêyî ku, ew ji cihê xwe bilive xwêdaneke zelqyî wê dipêçe û helkişa wê bilind dibe; xewneke kevin û dûr têtê bîra wê; ew û zaroyê cîrana di ser kayê de li ustûyê hev niştine, derpî datîne, ji nîvî û jêr de dibin av, şor û şêrînî tevî hev dibin, mij û dûman di bêvilên wan re davêje.

Zêneb heykelê ewî zaroyî dinasê; kurê cîranê wan e, ewê ku bi destê zaroyê wê hatiye kuştin. Ew têtê û di ber lingên wê de rûdine, bi rûniştina wî re dilê wê lêdide û kaniyek di nîvê wê de derdibe. Lê heykelê zaro xwe li ber lêmiştê digre û bi avjenî xwe dighîne seriyê kaniyê, çala reş. Zêneb hest dibe ku, hestiyên destê wî bi hindir zikê wê de diçin û hunava wê diçirîne, kaniyek..

bahozek ji êşan di nîvê wê de der dibe û demê ku, heykelê zaro ji nav lingên wê radibe ser xwe û ber bi komên qoq û hestiyên ve bi rêdikeve, ew di dest wî de

laşê zaroyekî ser jêkirî dibîne.

kurteçîrrok

- 39 -

Bûyer

-Bese, aa.. ax tu dêşînî. Bi gotinên xwe re. Beko destê xwe da sîngê Memo û ji piş xwe têveda. Herdu zaro di temenê hevda bûn, heroj sibê berbangê bi hev re dertên ber karikan û îro dema ku, çavên wan bi du karikên hildipekîn ser piştta hev, ketin, ewana ji hev xwestin ku ew jî wilo bikin. Destpêkê her yekî dixwest ew ê yekê be, da ku hilpekê ser piştta yê din, lê di dawiyê de Beko bi rola yê duduwan razî bû.

-Dê bimeşe? Memo derpî hilkişand xwe.

-Kanî hîne min we nekirî. Beko got û xwest bi zorê derpî ji Memo dîne, lê wî xwe ji nav lepên Beko derxist û revî. Ji kerba re Beko rahişt kevirekî û da dû, xwe nedît ku kevire wî di bin guhê Memo de kaniyeke ji xwînê, ji tolê derdike û ew bi dev-geza diçe erdê û çend caran mîna çivîkeke ser jêkirî dipirpîte û xirînî ji gewriyê ve tê. Piştî ku Memo vedipeke û li erdê dirêj dibe û Beko digeh ser, xwest derpî jê dakişîne. Lê dema çavên wî li golên xwînê dikevin û vemirtina laşê Memo di tiliyên wî kurteçîrrok

- 40 -

re diherike, riwê wî berdavêje û ji ewan deran ber bi mal ve direve.

Bîst roj di ser bûyerê re diborin, germbûna şevbêrkên civînên gundê Mitkê pê li dar dikevin û pir

şax jê têne kişandin. Giropekî digot: “Beko kurê dêwekiye ku, ajdahakî kor di şevê de û di riwê mêrê wê de, li diya wî dibe mêvan û Beko diçîne”. Lê giropekî din ku, di bin seroketîya mele Ehmed de bûn, li hember ewana derdiketin û digotin: “Na, ev gotin ne raste, tiştê bûbû ji mele bibhîsin: weke hûn dizanin Zênebê; diya Beko, gelekî hez bavê xwe dikir, heya navê wî li zarê xwe kirî û roja Bekoyê Mezin mir, hiş di serê wê de nema; heroj di nîvê şevê de ew ji ser tirba bav digirtin û tanînin mal û di şeveke zivistanê de, guv-guva bayê Circim bû û tû di seriyê mirovan de qij dibû. Iblîsê-neletetula- bi bê re kete nefsa wê û gava ew anîn ba mele Ehmed, ew neletetula boriya û ji nefsa wê weşiya. Lê bi ya mele nekir û ji bilî ewê carê bi ba mele da nehat û xwesteka mele ku, wê şeş mehan bi ava zemzemê misde berda û weha Iblîs ji nuh ve ket nefsa wê û ev kurikê mizeret; Beko ji ewê bayê reşe.”

kurteçîrrok

- 41 -

Giropekî jinan jî di nav xwe de çêrokek li ser zayîna Beko ristibû, digotin: “em pîrek bi evan tiştan dizanin, ya rast eve; Beko kurekî zîneyetiye, zîneyetiya di navbera Mele Ehmed û Zênebê de hêşt ku, ev bêjî bi zikê wê keve”. Ê nîşandana wan ji rastgotinê re jî, neçûna Zênebê ba mele bû û gava peyva misdana bi ava zemzemê derdiket holê, her yek bi xiz-xizî dikenî û tepêk li pîreka di nik xwe de dida û pîre-pîre çav lûsdibûn.

Di roja bîst û yekê de Beko winda dibe, helbet li ser windabûna wî jî pir gotin û şirovekirin çêbûn. Lê mixabin ti tişt negiha me, malbeta Beko ti dever û war nehîştin, lê Xwedê wî bide; Stêrek bû û ji ezmên rijîya û li dawiyê Zênebê xewneroja xwe got.

KÎN

-Ez bi rûya ve çûme erdê. Bi evê gotinê, bavê Beko ji nav malbeta mala Memo vejerî û gote pîreka xwe. Heya ku, dilê me di cî keve, ewan camêran em teklif ba kurteçîrrok

- 42 -

xwe kirin û dixwazin xwînekê jî birjînin, da ku dilê me ji hev re sayî bibe.

Û li ser xwesteka wan, çend rî-sipî ji mala bavê Beko û digel wî û Zênebê, di ewê êvarê de çûn mala bavê Memo. Piştî ku şev kal bû û demeke dirêj bi çêrok û çîvanokên dêwan û dizîya ewana ji zaroyan re, derbaskirin, ewana amediye xwe û xwerinê kirin û hûrikhûrik sifre rêxistin. Li dawiyê, tepsîya qurbanê û bi hilgirtina du xortan ji malbata mala bavê Memo, kete hundirê mêvanan û di nîvê sifrê de danîn. Deng li mêvanên xwe kirin, ew ber bi sifrê de hatin, li dora wê gustîlek girtin û bi gotina: “Bi navê Xwedê” re. Kalemêrekî nana sêlê ji ser laşê qurbanê; Beko... avêt.

Cindirês-93.

kurteçîrrok

- 43 -

kurteçîrrok

- 44 -

RIYA KOR

Bi daketinê re serî li kenara derî ket, hin niç-niç ji kesên rûniştî hatin û bêyî ku, li ewana vegere, xwest bi lez çaterêkê bibire. Kete ser resîfê çepê û serî weke hertim bi ser sîng de lûskir, lingên wî rê lezberkirine; ew dizanin ku divê du-sed û bîst û sê gavan bavêjin heya bighin ber pêpelokên dertên taxa Çiyayê Seydo (Şêx Mqşûd) û dema ku, ewî gava bîst û çaran piştî du sedî avêt, lingê xwe hinekî bilindkir, lê ew bi hêz hate xwar û hêst ku, ew di jimartina gavên xwe de bigûman derkeve; çima lingê wî li ser pêpelokê daneket, lewre serî hildide.. taxa Ç. Seydo winda bûbû.

kurteçîrrok

- 45 -

Çav di seriyê H. Memo de ziwa bûn û hin çilpikên xûydanê di cinîkan re herikîn, ewî dizanî.. didît ku, pir tişt di jiyânê de tîn guhertin.. windakirin û yekî dikarî hin nimûne banîna ber çavan, weke em bêjin windabûna çend kesên gundê wî di nav bêna şev û rojekê de û windabûna pozan ji rwên wan û hin tiştên din ên biçûk û veşartî; mîna ziman û çend gotinên zêde ku, xistibûn ferhenganê, weke gotinên azadiyê, mirovatî û serbilindiyê.. h.d. Belê H. Memo carekê ji devê Kalemêrekî bihîst ku, welat jî winda dibin, lê wê ti piwîstî neda gotina kalemêr û got: evê han xerifiye, nizane çi dibêje.

“ -Wilo çênabe, ev li dijî newamîsê xuristê ye.. na ev

xewne”. Xwe carekê-dudiwan qurmiçand, lê ji berî ewê yekê jî dizanî ne xewne, xweş tê bîrê ku, ew ji evê sibê de, di ku û kuderê re çûye û hatî, heya ji berî du katan ew li “Siryana kevin” bû û wî li ba hin dostan şevbihêrka xwe bi dawî kir. Ê piştî ku piyala sisyan bi serî kir, ewî xatir xwest, derket ser riya Da-irî û li pêş “fabrîqa singan” ji salonê peyabû, heya seriyê wî jî li kenara derî ket û hin niç-niç jî li dû xwe hêştin. Ev bûyer bi temamî kurteçîrrok

- 46 -

di mejî de veğerandin, bêyî ku gava bîst û çaran ji bîr bike û ya bîst û pêncan jî bavêje.

-Piştî ku H. Memo ji nişkabûna bûyerê şiyar dibe, çend çaran bi kerb çavan misdide; “ne dûre ku çav jî dixwazin lîskeke bînî seriyê min”. Lê bê sude bû, du dîwarin û riyeke di navbêna wan de dixuşe, ew dike nake dawîya rê bibîne, lê bê çare dimîne û taxa “Çiyayê Seydo” windabûye. Bi naskirina evê yekê re wî pişt da dîwarê ku, di ber re dimeşe, ew dizane ev dîwar û yê hemberî wî yê du goristanane, yek ji yê xwedî poz re ye û yê din jî ji yê bê poz re hatiye avakirin.

H. Memo van heru goristanan xweş dinese, heya rojekê ew di nîvê şevê de hat û xwe xist hundirê tirbeyeke vekirî ji yê bi poz, lê dema dît ku, goştê di navbêna dêv û çavan de diwerime, ji ewan deran revî û veğerî mal, lê her ku wî nêzîkî li mal dikir bihnek genî ew dipêça û ev cara yekemîne ku, tiştê wîlo pêre çêdibe. Di sibeya roja din de û gava ku, ji mal bi derket

û her ku, yê çav bi rûdêmê wî diket xwe jê bidûrdixist;  
hevalên wî yên li kar û piştî ku, ew derbasî odê bû, bêyî  
ku silava wî vegeînin ji cem bazdan û çûn ba  
kurteçîrrok

- 47 -

gerînende, jê re gotin ku; “pozekî hevalê wan çêbûye.”  
Di cih de wî rahişt telefûnê û hîne gotin di şîrîtan de  
ziwa ne bûbûn, otombêleke reş li pêş deriyê kargeha  
ku, H. Memo têde kar dike diraweste.. û ji wê rojê de  
navê wî ji çî kaxizên ku, di bajarê wî de hebûn, winda  
dibe.

-Te çî li ber dîwêr windakirî. Gotinin ziwa ku, di  
bihna kefnikê de hatin gevizandin, ketin guhên wî, lê  
dîsan jî ewana hinek hêvî di dilê wî de pişkuvandin û  
hêştin ew têkeve ewan baweriyên; eger ku ew nuha  
bizîvire û bervê wî ber ve riya Da-irî bibe, dê riwê  
mirovêkî zer bibîne. Lê heya ku çav dibînin rê û dîwarên  
herdu goristana diherikin, ne riya Da-irî, ne jî “fabrîqa  
sîngan”, hemû windabûne û rê tazî maye, ne dar û ne jî  
dîrekên elektrîkê, her ew bi tena xwe bê dengiyê  
diçirîne. Çav bi jor de hildan dît ku, heyv bi devkenî li wî  
dinhêre û bi riwêkî sar dibore.

-Û.. te çî di heyvê de jî windakirî. Gotin û dengê berê  
dîsa dikevin guhên H. Memo û evê carê digel lêdana  
ser mil. Gava ew li wî kesî zîvirî çend didan ji dêv weşîn,  
bi dîtina ewî qoqê tazî ku, xwe di ser dîwêr re dirêkirî.  
kurteçîrrok

- 48 -



-Ev bû du-sê carin ez dêng li te dikim û deng bi te nakevê, çi bi seriyê te hatî. Û bi gotinên xwe re ew derket ser dîwêr û dest ber bi wî dirêj kir. “Ka destê xwe bide min”. Û bêyî ku ew zanibe çi dibe, destên wî bi jor de dikişên, ew jî dikeve hundir goristana kesên bê poz.

-Ka li vir rûne. Û hinistirî ji wî cihî hilkirin, da ku H. Memo lê rûne. “Ji berî her tiştî ti tişt bi te re heye, lê na.” Û gava H. Memo qutiya titûn ber bi qoqê tazî dirêj kir, ewî çixareyek ji xwe re pêça. “Ji kerema xwe ji min re pelê çixarê şil bike, belê av-ax qedexeye ji kesên evan deran re, her ew tenê qedexeye”. Û piştî ku, H. Memo çixare şilkir, ew da dest-hestiyên wî û bi kişandina wî ji çixarê re, dûmên di nav parsiwan re avêt. “Ez di çavên te de pirsê çêroka xwe dibînim”. Ew nefeseke nuh li çixarê dixê.. û H. Memo dibîne ku, dûman ji seriyê wî bilind dibe.

Şam-93.

kurteçîrrok

- 49 -

PÊVAJOKA TIRÊNÊ

“Ji

George Orwell re”

“ -Hîne zûye, ezê piçekê paldim, lê ji berî hemû tiştî divê bînim bîra xwe; ka min ti tişt ji bîrkirî.. dermanê Pîrê, cilên ji pîrekê re, lîstika Narînê, na min tişteki ji bîr nekirî”. Çavan li ser evan ramanan dide hev, xwestek yeko-yek ji ezmanê mejî difirin û di bîrên xewnan de winda dibin, perde li dû hev têne berdan û roniyê çavan

tête vemirandin.

Rê teng dibe, şûna pêyên wî namîne ku, pêvajok û meşîna xwe bibe serî, herdu dîwarên li aliyên rê li wî têne hev, nema dikare di navbera wan re derbas bibe, bihin teng dibe.. tê girtin. xûydanekê zelqoyî wî digire.. dipêçe, lê ji berî ku biqîre, lingên wî ji erdê hildibin.. dibe kurteçîrrok

- 50 -

perek û bi ber bê dikeve.. difire û tirseke goristanî dikeve dil. Daxwaza wî ku, ji nû ve dakeve, lê bê hemdî wî, ew her bi jor dikeve. Piştî bilindiyekê serast dibe û mîna başîqekî zikê aso diqelêşe. ber bi jêr ve dinire. çav ji serî diweşin; gundekî zere.. malên axî, ti dîwar û banî li ser hev nemane, bê dar.. tilûr û çivîk û deware, bê kes û mirove. Di nivê gund de kaniyek xwînê diherike û di rex de goristanek avabûye, lê kurm û kêzikan ti hestî, qoq di ewan tirbeyan de nehêştine û li şûna ewan, hin gorên vekirî û vala mane. Dema çavên wî bi goristanê dikevin. mîna başîqê ku kevroşkekê bibîne. xwe berdide ser û bi lihevketina seriyê wî û kêla gorekê.. xwîn dipijiqe.

Bi hêz serî hilda, çavên wî dikevin ên pîrekeke rûmirî, destên xwe dirêjî ser riwê wê dike.. sare, diqerimin û bi qêrîna xwe re bûka lestîkî, ji dest xwe davêje. Bi veqerîna hiş re, çend caran bi hêz hilma xwe kişand û berda û di cî de rûnişt.. cixareyek pêxist, ber bi lîstika avêtî de dinere ku, her piyek bi cihekî de firiye. Rabû ser xwe û li hev siwarkirin û dema çavên wî bi

katjimêrê dikevin, hufînî jê tê û naskir ku, demeke dirêj  
kurteçîrrok

- 51 -

di xew de maye, bi lez tişt birefikir, da ku, xwe bigihîne  
tirênê.

“ -Gereke min titişt li şûn xwe nehîştibe, keça min  
Narîn, dê ber min bê û biken bûka xwe, di hembêza xwe  
de, di xewê ke û pîrek.. ax, divê ji berî hemû kesan ez  
wê bi cilên nuh bibînim, lê ji berî ku ew li xwe dike, divê  
ew pêlêkê.. di ser re bimeşe û belkî ev derman jî yê  
paşin be ji bo pîrê.”

-Tu kore.. pêşiya xwe binere. Kesekî jê re got, lê  
bêyî ku ew li wî vegere û zanibe bê çi bû, rîya xwe ajot û  
hêviya wî ewe ku, xwe bigihîne tirêna ku, diçe  
Qamişlokê. Di nîvê rê de Bêkesê Selmo dest avête  
bêrîka xwe, kab sist û sarbûn û ji çûn û hatina kesan,  
virde-wêde hate avêtin.

“ -Ji vê sibê de xwe amede dikim, ji bo ku ti tiştî ji bîr  
nekim, lê nûha ezê li rawestgehê çawa xwe binasim û  
xwe bi polîs bidim nasîn; bê zanav û nasname ka ez  
kîme, kesî cûzdanî xwe ji bîr bike heye.. ez ji nuh ve  
vegerim.. tu yê kuva vegerî, tu nema dikarî.. tirên wê  
bimeşe.. bi meş.”

kurteçîrrok

- 52 -

Û bêyî ku, ew vegere mal û zanava xwe bîne û  
karibe xwe binase ka ew kiye, dev da rawestgeha tirênê  
û di kûraniya mejiyê xwe de pirsî; “gelo ew ti rojan bûbû

xwedî nasname, da ku, ew vegere mal û wê bîne”. Ev jî keysa min e; nivîskarê evê çêrokê ku, ez wî; Bêkesê Selmo bi we bidim nasîn.

Temenê B. Selmo di sîh û heftan de ye, wî ji berî çend salan xwendina bilind di zanîngeha Şamê de, beşê dîrokî kuta kiriye. Ew bê jin e.. lê demê ku, jê re digotin: “tu bê jinî û ti keçên te bi navê Narîn tine ne,” ew dikenî û ji kesên derdora xwe re digot: “hûn wilo dikin ji bo ez cihê wan ji we re bêjim û hûn herin wan bidizin.. bikujin, ne.”

Kesî nedizanî bavê wî kiyê, her tiştê ku gundiyên wî li ser dizanîbûn, ku ji berî sî salî pîrekek digel zarokekî poz kefnikî hatin gund û çiqwas xwestin zanibin; ka babeta wan çiyê, lê pîrekê derî di riwê ti kesî de venedikir. Heya roja mirina wê û piştî ku, bihna genî bi ser gund ket, derî li ser şikandin, lê ji bihnê.. ji kurm û kêzan kesî di xwe re nedît ku, derbas cem wê bibe, lewra di nav xwe de gotin: “tiştê rast ewe ku, em xênî bi ser de bînin xwar û bila bibe tirba wê”. Di ewê demê kurteçîrrok

- 53 -

de, Bêkes hîna li Şamê dixwend û kesî nekire seriyê xwe ku, xeberê bidin wî û heya roja xwendin kuta kir û vegeerî gund, dît li şûna mal û dayikê kavileke û li ser kêlika wê qirikeke reş dixwîne.

Ji ewê rojê de, B. Selmo ji gund derkrtiye û li piş xwe neneriye. heya bi roja îro û weke hûn dibînin ku. wî hemû tiştên xwe kom hevkiirî. bes dibêje: “min zanava xwe ji bîrkiirî” û ji ber evê yekê nema ew dikare xwe

binase û ne jî xwe bide nasîn.

-Hîna dê çi xweş be û bi ser evê yekê de ku, tirênê şaş bikim û herim li ya Şamê siwar bibim”. Bi ketina hundirê rawestgehê re, ev raman hilpekî mejiyê Bêkes û tirseke din xiste dilê wî. Derbasî hundirê fergûnê bû, bêyî ku bipirse ka ev tirên kuve diçe; ji ber ku ne tikes li ber xwe dît, da ku, ji wî bi pirsê tu kiyî û ne jî ti tirênên dîtir dîtin. Di hundirê tirênê de ew, careke din, ji xwe pirs; “ez kî me”, lê pirsê wî bê bersiv dimîne.

-Bi ketina deriyê fergûnê re deziyên pilindir; tevnên pîr-pîrê qetandin û her ku, ew ber bi çi danîştokê diçe, ji tozê, nikare rûne. Tiştên di dest xwe de danîn aliyekî û danîştokê ji xwe re paqij kir, piştî rûnişt dît lingên wî tîn kurteçîrrok

- 54 -

gezkirin û gava des avêt ber lîngan, çend gêrik; mêrî ketin nav tiliyan, sixêfin gotin karkerên tirênê, ewên ku bi paqijiyê tirênê radibin.. û gava xwest zanibe kesî gotinên wî bihîstin an na, li dor xwe zîvirî, lê çavên wî bi riwê ti kesî neketin; “min tirên şaşkirî!” û rûpelekî dî ji yê mejî bi pirsê han re kizirîn. Ew ti kesî li ber xwe nabîne ku, baweriyekê ji devê wî bigire.

“ -Tu mirovekî dil giz-gizî. Belê, ev tirên ya Qamişlokê ye.. ji bilî vê li ser rê tinebûn.. ne xeme, çima kes lê siwar nebûye.. ma tu xudanê çûn û hatinên xelkê ye, belkî îro kes bi rê de naçe.. nasêfire. Bes ka tu yê bi vê re çi bibêjî; çima kurm û kêz di hundirê fergûnê de evqasî kom bûne!.. weke ku, min berî nuha jî got:

xizmetkarên wê bi karên xwe ranabin, dilê te kete cih.  
Dê hinekî rakeve, rê dûre”. Bi dawiya ramanên xwe re,  
Bêkes çavan dide hev.

Piştî kurte demekê ji damirandina çavan, dengin  
ketin guhên wî û pir neçû dît ku, çend xort derbasî cem  
bûn, li dû wan pîrjinek çav bi şelmût, digel wê çend  
zarokin kefnikî, li dû wan çend tivingin dev bi xwîn, li dû  
wan yekî zik mezin û di dest wî de dirûmek ku, yek çilpik  
kurteçîrrok

- 55 -

nêm û xwîn, jê dadirivin û gava ku, lingek ji ewî dirûmî  
ket û çend kêzikan êrîşî ser kir, ewî kesî xwe xar kir û ji  
devê wan derxist, carekê-dudiwan pifî ser kir û avête  
devê xwe, bû çeç-çeça hestiyên ling di nav diranan de,  
li dû wî segek derket fergûnê û gava çavên wî bi Bêkes  
ketin diran tûjkirin û bû giz-giza wî û li dû seg, perwenek  
ku riya keçeke teze; hîne di buhara xwe de ye, vedike û  
bi nîştina wan li ser danîştoka di nik wî de, dilê wî hate  
givaştin.. û şikest û.. li dû.. dû-man.

Tirên “bi rêket” û Bêkes perçên dilê xwe birefkinin,  
dest avêt pirtûka di pêş xwe de, çend caran cildê wê  
vekir û dahev û bi ewê yekê re jî û di qurzîka çavan re li  
keçikê dinhêre; ka bala wê lêye, çavên xwe berdane  
pirtûkê yan na.

,”1948“ -ev çi navnîşane. Keçik bê pêşkêş, pirsî û  
hêşt ku, ew çend caran û ji berî dev ji hev bibe, xweziyê  
daqurtîne.

-Romane. Piştî demeke dijwar lê vegerand.

-Li ser çiyê ev roman.

-Dîrok û paşeroja hêza reş dide ber çavan? Bi gotinên xwe re wî çav berdand sîngê wê; du kevok têde kurteçîrrok

- 56 -

hatine veşartin, lê nîrînên wî û bi tîna mejî, di nîvê rê de çelmişîn.

Daxwaza Bêkes ji romanê ew bû, lê piştî ku keçikê xwest wî binase, ewî nikarî bersiv bida û bi yek gotinê, navê “Mirkufikî” li Bêkes bû û li ser evê navî naskirin çêbû. Ji berî ku, ew bigihên dawiya rê, Mirkufikî jê xwest ku li aliyê din ji pêvajokê, li bajêr.. hevdu bibînin. Tirên dirawest û her kesên siwar, peya dibin û Mirkufikî mîna destpêkê bi tena xwe di fergûnê de rûniştîye.

Îro ev sê rojin, ji hatina B. Selmo ya rawestgeha tirênê û di evê sibeya roja sêyemîn de, vaye karkerên tirênê li ser karên xwe belavbûne. Habîl û mîna hemû karkerên rawestgehê hîne çê çav venekirine; yek gol xewê têde miçiqîne, ew ketî ser rê û bi hundirê rawestgehê de diçe, Piştî ku, ew riyên hesinî yên nuh avakirine û bi kar tînin derbas dike, dikeve nav yên kevin û li dawiya dawî digihê ewê riya dixwaze. Ji berî çend û çend salan ve, nema ew rê bi kar tînin û her ku, hesin gerek dibûn jê hildikirin, li dawiyê ji bilî çend-sed mitiran ji rê nemabû, ew jî di bin hinek fergûnî avêtî de û bê serî, li ser riya ji bîr kirî, rawestiyabûn.

kurteçîrrok

- 57 -

Gava Habîl nêzîkî li ewan fergûnên jibîrkirî dike,  
reşiya kesekî di hundir, di piş cama bi toz û di yek ciyan  
de şikestî, dike û bi gotina; “tu kiyî” ew dikeve deriyê  
fergûnê. Lê bi dîtina ewî kesê ku, di hundir fergûnê de  
rûniştî û rewşa wî hêşt ku, ew di kêlîkekê de rîh sipî  
bibe û bi qêrîna wî re hinek karker ber bi fergûna wî  
bezîn.

Lê ti kesî, ewê bê za..na..av ku, di fergûnê de rûniştî  
û dev ji hev kirî û bi malika pilindir hatiye tijîkirin, girêdan  
û di qurzîkê re jî yek gêrkiên sipî ji hundirê boriyê  
dertên.. nasnekir.

Cindirês-93

kurteçîrrok

- 58 -

KOÇERİYA LAŞEKÎ

Dareke sêwî û rûte, ji berî çend salan û bi lêdana  
birûskekê, agir pêket, lê ewê hîngê jî ti kes nehat, da ku,  
wê vemrîne û ji xwe re bike êzingên tifikê; di baweriya  
gundiyan de, ku canê gelek şehîdan li dora wê ketine  
xewê. Hatina kundekê jî her şev ser şiqinê wê yê herî  
kurteçîrrok

- 59 -

bilind û banga ewî, bêtir, tirs dixist dilê gundiyan. Lê  
tirs a wan a mezin ew bû; ku di nîvê şevan de, martîrê  
herî mezin ji nav mezêlê gund dertê û diçe li bin darê  
nimêja xwe dike.

Kesî ti çaran ew bi çavan nedîtibû, bes hin gundiyan  
digotin: “me şûna kaboka wî li bin darê dîtiye”, lê hinek



xortên gundê Dugurê; ewên xwendevan, digotin: “ev giş derw û xurafatin” û çend mirovên li ser riya mislimantiyê, ewana jî û bi dizî çêrokek xwe, di nav gund de, li ser darê ristibûn û çêroka wan jî; “ku her yek dimire û di mezê gund de tête veşartin, dihêle ev dar reştir bibe û şirovekirina wan jî, ji ewê yekê re ku, dar rehên xwe ber bi gora nuh dişîne û xwîna kesê mirî dimije”. Û ev komik, îro du rojin, li benda reştirîbûna darê ne. Carekê dudiwan xwest xwe bilivîne, lê mîna mirovê ku pîrhebok li ustî nîştî, bihna wî çikiyaye û hilmeke nexweş, genî bêvlên wî dagirtine û laş jî kevirê êşe; qet nikare wî bigerîne. Termê Mihemedê Selmo duxre, bûye riya gêrikan û êş pir caran mîna birûska didanan, ji deverin laş dikişên. Dike nake ku pîrhebokê ji ser xwe bişo, lê ji nuh ve şikestî dikeve, M. Selmo di seranserî kurteçîrrok

- 60 -

jiyana xwe de bi navê Direkola ne bihîstibî, lê ew anuh û bi diranê xwe yên tûj-xwînî li wî bûye mêvan û mêxekî zengarî kutaye qirka wî, hêştî ku, çav di seriyê wî de bikizirin. Ewî bawer dikir ku, hemî nexweşî pêre çêbibin, lê heya ku Hekîmê Luqman jî jê re bigota: “rojekê tu yê kor bimînî”, dê tiliyên xwe di çavên wî de biçikandana û ti carî jê bawer nekira.

M. Selmo dike nake ku, dora xwe bibîne, lê perdeyeke reş li ber çavaye, xwest tiliyên xwe nêzîk ber çavan bike û çareyekê ji meşa gêrikan re bibîne, lê dest ne livîn û xwe mîna ewê mendalê ku, ji serî heya ber bi

lingan û di nav caw de hatî pêçan, dît. Piştî çendekê ji berxwedana xwe û da ku, destan ji bin bendên caw azad bike, dît ku bê çareye û mîna ewê şerê aşên bayî dike ye, lew re û weke hercar, demên ku ew digihêşt bê çareyê, ew wilo ma sekinî û kûr ponijî.

“ -Xuya dike, pir tiştin nuh di jiyana min de çêbûne, divê ez li ser rawestim, lê ji berî ku bi bûyerên nuh diramim.. ka berî çendakê ez li kubûm.. min çî dikir.. çawa gihiştme vir û nuha li kuderê me, lê bêtir ev bihna kurteçîrrok

- 61 -

genî û meşa evan kurmikan, dihêlin di serî de babilîsok der bibin.

“ -Ma, ez di xwe de me, çima bihna min tenge”. M. Selmo di navbera xwe de dipirse. “A.. a belê.. raste, ji berî rojekê.. ji kuve tu dizanî ku, rojeke.. belkî bêtir be, du roja.. salek be jî, na hîne hêza mejî û ramanan li ciye; eger ku bêtirî rojekê ba, ewê çaxê pir hûrikên bûyerê dê ji bîr bibana û ji tihîna re.. ezê bimrama.” Gotina mirinê bi tirs di kûraniya wî de derdibe, ev cara yekmîne ku, ew bi hovîtiya gotina mirinê dihese.

“ -Belê.. hema ku, ne wilo be çênabe, ez û kê bûn, im.. im ez û kurik li nav erd bûn.. raste, min deziyê çêrokê bi dest xwe ve anî.. erê, bi Xwedê me cot dajot û piştî demekê ez westiyam, min ji kurik xwest ku, li şûna min cot bigre û ez hatim ber ewê hîmê, di nav taqimê me û Hesoyê de, min got; piçekê xwe dirêjkim.. bihna xwe derînim. Lê mîna yek qamekê li zirava pişta min bide

êşeke tûj û sar ez girtim, min dengê-dudu..”. Ji berî ku,  
ew bêranînên xwe bibe serî, xuşînî xûrtbû û mîna  
marekî nêzîkî qamçika wî bû, hêdî-hêdî, lê bi hêz û bê  
vegerîn di hinava wî de diçe xwarê “ka ev çiyê, kesî din  
kurteçîrrok

- 62 -

bi min re heye, çima dengê wî nakim, belkî ew jî mîna  
min kore.. pek, ma ev cihê kora ye.. çima ez deng lê  
nakim”. Tiştê din ê ku, dihêşt matmayiya wî bêtir bibe;  
ew ne hestiya wî ya bi êşê, tevî ku ew damar di qamçika  
wî de diçû xwar.

Dema M. Selmo dev ji hev kir, pariyekî şil û nerm  
kete devê wî, diran li ser dane hev, vejînî jê hat û mîna  
nêma kunêran ber bi gewriyê de herikî, digel bihneke  
pîs. Ewê demê naskir ku kurmek, ji ewên ber bi laş  
kirine, ketibû dêv û ew di nav diranan de pelixandiye. Bi  
gihîştina evê yekê re hunava wî keliya û wek miya avis  
hilweşî, pêre-pêre, çend kurm din di dêv werbûn û bi  
lehiya verşiyê re, di ber qirika wî werbûn.

Piştî verîşiyê, hiş ji nuh ve dest bi karê bîranîna kir;  
“min deng li wî kir.. kurik dûrbû, zû zû nebihîst, lê caxa  
ku min çavên xwe vekirin, min dît ez li ser nivînan dirêj  
kirîme.. û.. na.. na, ne raste. Ev ti carî.. kesî wilo  
negotiye.. ez û mele, em gelekî dost bûn.. ta ewê roja..  
duh, îro li ber seriyê.. belê li ba min bû, pirtûka Qur.. a..  
nê û tizbiya wî di dest de bûn, yek ayet.. na.. na,”  
Kê derî li ser min girtiye.!

kurteçîrrok

- 63 -

Qamişlo-92.

NAMEYEK JI DÎROKÊ RE

Dildar.. ez li benda tebûm.. . Ez rawestiyam li ser  
kavil û kevneşopan, bajar.. malên axî yên ku, dîrokê  
windakirine û ti tişt ji bilî şopa ken û pis-pisa me  
nemaye. Li ewan deran, li benda te me û tu tê û kabika  
penêr ji destê min digrê û direvî. Belê, ez di kenim..  
kenekî bi dizî, min radihêşt nan û penêrê xwe û min  
dizanî ku, te kemend ji min re vegirtî. Lê dîsan jî ez bi  
ser kemenda te de dihatim ku, ez bi xefka te kevim û di  
dûv re bigrîm, xwe li erdê tol bikim, riwê xwe di erdê  
kurteçîrrok

- 64 -

bidim û bi hêsrên hevîrekî heriyê ji xanîkên me re  
bistrêm, yek caran ax dikete devê min û min dîroka Kotî  
û Kortiya jê fikir û di pişt re siya zarwên wan tê ber  
çavan. Zarokek li ber çavên min e, wî dest avête qopê  
goşt û ji dest keçikê; hevala xwe, revand.. hêşt ku, ew  
bigrî.. bi rondikên xwe ax-dem şûşt.. û dema ku, ez bihn  
dikim bihna diya min jê tê.

Dema dengên çeq-çeqa dikevin guhê wê, çavan  
radike.. hildide, li kûraniya aso meyze dikim.. sîk û  
sîberin dûmanî tîn ber çavan û dîrekên axî.. tozî bi  
asûman de radibin û dilerizin, ew nêzîk dibin.. û zarê ku,  
qopê goşt revandî ber bi ewana diçe.. destan ji wan re li  
badike; ew ji siwarên kuştin û talanê re destan dihejîne,  
rûdêm berkeniye, ken û şahiya zarokatiyê û di çavan de

roniya Ehuremezda. Lê Ehrûman li hember wî bû, ew tîrê reş.. tîrê Sergonê Dudiwan ji kevanê dertê.. berkenî û roniya Ehoremezda dupar dike û ew dikeve.

“ -Dildarê min, me nedizanî ku, li bajarên mezin ji te re kemend vegirtine.. û li hêviya nêçîriya te ne. Ji min û te, pariyên nê û penêr.. newrozê, bidizin û ji nuh ve hêsirên xwînî bibarînim.”

kurteçîrrok

- 65 -

“ -Ey pêlên di ser cendekê minî arî re diqulipin.. werdibin, ey derya dikele, kanî pêla min, viyan.. çî!.. Masiyê mezin daqurtand”. Xwîna sor-dagirî dihrik.. siwarên kuştin û talanê têde digevizin, tevî axa Araratê bû û.. hestiyên ewî zaroyî hûrkin, goştê telmeyî di bin pan û simên hespên xwe de kirin hevîr û li şûna xwe hîştin û siwarê dawiyê jî ruma xwe di heriya bi xwîn de vedine.. radike devê xweyî atûnî û dimije.

Diçin.. dimeşin, li ewan deveran talan dikirin, keçik temaşa wan dike.. şikeftên wan ên biçûk hilweşandin, seriyê bûka wê ya kevirî hûrkin.. herifandin û guloverên sor yên bi mij û dûman, di çavên keçikê de, vedimirin.

“ -Dayê.. ey derya bahozî, bigre.. hembêzke.. nehêle pêla minî sor bikeve binî. Bel.. wilo jor de hildin.. rahêjin ser milan.. ez hîne li bendê me.”

Wê dinirî.. temaşe dikir, temaşeya li ewan lekeyên sor; ew heriya xwînî.. ew hevalê pelixî û dema ku, erd hejiya.. teqiya û ji ûr û zikê xwe etûn avêt û.. ji deşta

Mûşê.. ji nav pêlên LOLO û KAŞIYAN, ew pehlewan;  
Akîm-AKRÎM dertê.

kurteçîrrok

- 66 -

“ -Derkevin.. bi rêkevin.. têvedin ey pêlên dogehê û..  
siwarên kuştin û talanê daqirtînin, bila pinpinîk û  
gangiliyên sor, li deşt û çiyayên welêt serî hildin. ..  
Dildar, ez li benda te me, tu kanî û çima nayî, were..  
were li cejin, di newrozê de.. na.. na, tu li cihê xwe  
bimîne, tev hevalên xwe, ezê bêm û li te bibim mêvan..  
tevlî te bim.. bi te re Buhştê par vekim.. li benda min  
bimîne, vaye Newroz tê.. Newrozeke nuh.. deryayeke  
nuh.. deryake bahozî kûr û ferehtir.. û martîrin nuh.

D

il

b

e

r

a

te

“

Y

A

R

kurteçîrrok

- 67 -

A

”

Têbînî:

“Ev nama di kavilekî de û li ser çermê zarokekî hatibû nivîsîn û tiştê ku, em pê rabûne, me ew ji wir wergirt û ne tiştî din.”

Heleb-87.

kurteçîrrok

- 68 -

BÎRANÎNÊN Q. OMER

DI ŞEVEKE BEREVAJÎ DE

“Stêrkek rijiya erşa

Silav da ax û ferşa

Ew tune şaristan

Bû mêvanê goristan.”

kurteçîrrok

- 69 -

Sêserî... nivîn û sê kes li ser dipirpiti, Piştî kurte-demekê di xew ve diçe.. na, Qilîçê Omer hîne temaşa stêran dike, heyv dêwe; “masiyên mezin ên biçûk dixwin, rûdemê xweyî sipehî, ji daqirtandina stêran diziye.. ne weye Remo”. Dêg li hevalê xwe dike, lê ji zû ve xîz-xîza wî ye. Hersê westiyabûn, ji derketin û daketina tirên û riyên teng ewên di navbêna du geliyan de; birînên delavan û ta ku, ew bighên gundê Şengêlê û çend rojan li wir bi borînin. Ewana her yekî rahiştibû tiştêkî û Q. Omer bi rola xwe, per û rengên xwe kiribûn tûrekî û ew avêtibûn ser piştê xwe.

“ -Kesek mir, xortek hate kuştin. Eger ku, ewî xortî jiyana xwe bibira serî, dê pir tiştên din jî bikirana.. ne dûre navê Bêkeso vemiranda. Lê mixabin mir.. mirin

sare”. Hîne dawiya rijandina ewê stêrê nehatibû, Q. Omer mirin û pêşeroja xort ji bîr dike û bi mêvantiya wêneya dilberê re, di bîr û sirûşan de, winda dibe û raman û nirînên wê, mîna gêrikan ku di sibeyeke biharê de derên çêriyê, serî dikolin.

“ -Pêmpilûk.. anê pêmpilûk”. Ji diya xwe re got û da dû, du gav navêtin û ew li kêrsekekî dilukume û bi devgeza dikeve, diranek dişke.. xwîn di dêv û bêvilan re kurteçîrrok

- 70 -

davêje. Wî dest rakir ber lêvan, lê ne xwîn û ne jî perwen; xewna dîtibû, zarotiya wî anî bîrê.

Kata sisyanê, ber destê sibêye, ji ser pişta xênî dadikeve, gundê (Bêkê) derbas dike û ber bi gir ve diçe. Kurmikên şevê çireyên rêwiyane.. xwest yekê bigre, lê gava bervê diçe winda dibe; “Na.. ev ne kurmikên şevê ne; roniya wan bêtire.. girsin û ew ne pîlên leşkerên Tirkane jî; eger ku ew bana, ewana ezê ne gihandama evan raman û nêzîkiyan, leşker keysê nadin mirov ku bighe nêzîkî ewana, berikên tivingên wan leztirî ramanaye, ewana di zik û damarên mejî de vedimirînin.”

Teneya tirsê, di rojhilat de, têtê avdan û her diçe bi temenê mirov re şiqin dide.. tirseke dîrokî ye. Tû û pirça Q. Omer hîne qijtîrbû, dema ku dengîn, ji yê rojên mirovê Endirtiyal, di guhên wî re derbas dibin û ji berî ku, kale-pîrên wî, yê di xwîn û laşê wî de raketî, şiyar bibin, çend guran bi hev re êrîş wî kirin. Ew direve.. bazdide, lê ji cihê xwe nalive, dora wî têtê girêdan,



dengê, kuzotin sor.. diranine tûj û zengarî di goştê kefnîkî de diçin xwar û nê m ji devê wan diherike.

kurteçîrrok

- 71 -

Perwena di nivê guran de, di nav kuzotên êgir de, dipirpitê ye.. kesên li ber puxarê, ku li tîna êgir digerin, temaşa şerê wî û.. dikin û deng bi yekî dikeve: “Biner law, çawa dipirpite.. de tu dikarê xwe ji nav êgir derîne.. ha ha.. ha..”. Kenekî zer-nê mî, tijî kurm, bi vekirina devê ewê dikenê re diherike. Dayîk ji aliyekî puxarê difire yê din, hêsirên wê çend kuzot vemirandin, lê hilanîna destekî, wê ji ezmanê puxarê tîne xwar û dihêle ku, ew jî cih di nav kuzotan de bigre.

Diya Q. Omer xwe ji şiqinekî davêje yê din, lê kes ji cih nalive, bi kûranî.. koranî temaşa şerê guran û zaroyê wê dikin, canê zaro di damarên guran re diherike û.. pirça wan diweşe, dev bi şûn de diçe, lingên pêş jî vedigerin û dibin du dest, zar û ziman dikeve devên wan, lê mezinê “gur-mirovan” demeke dirêj bê deng dimîne û li dawiyê deng bi wî dikeve: “me xwar, min jî xwar, serî û mêjiyê zaro hîne di ber diranên min deye.. ez gêj bûme.”

Ji xew şiyar dibe, ew di xûydanê de hatiye şûştin û hîne tirsaxewnê venemirîbû.. dengê du segan dike û bi kurteçîrrok

- 72 -

badana serî re û temaşekirina herdu nivînên hevalên ku, di nav de raketî, dît du seg di nav ewana de dikûzin.

Heleb, 91

SOL

“Ji diya

te.. min re”

kurteçîrrok

- 73 -

BÎRANÎNEKE DÛR

“Di sala xelê de, tazî.. rûzerî nîşanên jiyana min bûn  
û di rojê de, ji ewan rojan û weke her car, diya min  
ji min xwest ku, ez bi seriyê bizinê bigirim û wê bibim  
çêriyê.. . Bû ting-tinga min û min bablîskeke ji tozê û  
daxwzan li dora xwe gerand da ku, di zukakên gund de  
bilîzim, “Kevir-çivîkek” ji destê diya min difire û seriyê  
min bi taceke sor dixemilîne û kevir li ber lingê min cih  
digre. Wê satila şîr danî aliyekî û hat ku, ewê taca han ji  
min bidize.. ji pêş çavên mêrê xwe veşêre.”

HER LÎSTIKEK.. BI” . ..“

Piştî ku, dayîk seriyê wî derman dike; bi ava pîvazan  
dikewîne, sicima bizinê dide dest û çend şeqaman li kepîra wî  
dide û ber bi geliyê (Zompa) bi rê dike.

Ehmedê EŞÊ seriyê bizinê dikşîne, di çend salên  
berê îsal de -temenê wî roja îro diwanzde salin- wî ev  
kar bê ramyarî û hezkirin dikir, eger ku, em nebêjin; wî  
kurteçîrrok

- 74 -

yek caran jî bi hezkirin ev kar dikir, emê dûrî rastiye  
herin, lê nema mîna berê; demên ku wî derpî ji xwe  
datanî û li piş bizinê disekinî, dil û hinavên wî bi evê

yekê hûnik bibin û îroj dixwest li mal bimîne; belkî “Sînem”, keça cîrana bête mala wan û ew hinek keys bibînin, da ku, bi hev re bilîzin.

Piştî kuştina çend çivîkan bi lêstîk, hevalê qirkirina teyr û çivîkan û lîstikên bi karikan re, digel dewarên xwe dighe cem wî û hîne ewî bihna xwe dernexistibû gotê.

-Min cîkî çiwîkan li vir dîtî, hîne ji berî çend rojan hêkên wê sipî dikirin. Bi gotinên xwe re wî pençek mewîj li dêv bada û ji berî gotin û xwarina mewîjan bibe serî, ew ber bi hêlîna gotî bezî.

-Ne beze.. ewê bifirin, E. EŞÊ gotê, lê tevî gotina xwe, ew jî bi bezeke pilnigî ber bi ewê hêlînê diçe; “ka ew li ku ma”. Hîna pirsê wî di dêv de ziwa nebûye, ew dighên ber çala xerafê.

Di çûkaniya wî de, tiştê tewrî bi tirs ji E. EŞÊ re gotina xerafê bû, raste ti caran nehatibû ber wê.. lê diya wî wêneyeke dojhê di rûpelên mejî de çandibû û carên ku, ew ranediket, bi gotina dê ewî bibe û bavêje binê kurteçîrrok

- 75 -

xirafê dilborî diket. Lê carên di xew de didît, ku ewî di çaleke kûr.. bê binî wer dibe û yek mar li wî têne alandin, bi qîrîn ji xew şiyar dibû.. û diya wî mîna marekî ji yên xewnên wî, xwe ji nav lingên mêrê xwe dikişand.. dihat nik wî, da ku, wî careke dî û bi tirsê ji xerafê di xewê ke û ew jî careke dîtir xwe têxe nav nigên mêrê xwe.

Anuha û bê zanîneke berê, ew bi jorî devê çala

xerafê dikeve, kulmeke ba xwe bi hêz li qirika wî bada û tevizînokek kete laş.. heya demekê ti tişt ne dît, ji bilî cergeke reş; devê çaleke fireh û evê yekê, xewnên wî anîn bîrê.

Dema ji evê nişkabûnê şiyar bû, xefkeke tirsê ya din ew girt; bi dîtina ewî hevalê xwe û xwe berdana ji nivî û jor de bi hundir “xerafê” de û ew dihêle ku, ziman di dêv de bibe perçeyeke kulav.

-Êho.. hêy.. Êho.. hêy.. . Deng bi hundur çala kûr û fireh dikeve, “were bi lingên min bigre; cihê wan kûre.” Careke dî deng ji hundur çala xerafê tê, lê E. EŞÊ ji cih nalive. Ew hevalê din, serî ji hundur dertîne û bi dengê qêrîn ji wî re dibêje: “tu ditirsî.”

kurteçîrrok

- 76 -

Zerbûna lêmûnan di riwê E. EŞÊ de berdavêje û bi xwîna beravêtinê re, ew tete şuştin.. pelixandin. “Were li vir rûne, bi lingên min bigre”, E. EŞÊ dixweze jê re bêje: “ka em vegerin û çivîkên ku, min kuştine.. ên ezê bikujim, bila yên te bin, bes em ji vir bi dûrkevin.. bila çirt û mar seriyên hev buxun”. Lê gotina; “tu ditirsî”, kevirê êş e û wî dihêre.

SOLA LÎSTIKÊ

Bi herdu lingan digre.. jê tete xwestin ku, ew hinekî din wî bi jêre de berdê.. ew dişimite û du mar ber bi jor de dikişin, xwe li tilyên E. EŞÊ dalînin, wî bi jêr de; bi kûrnaniya çalê de dikşînin û didanên yekî goşt diçirînin, jehr.. xwîn ji kefa dest û bi nav tiliyan de diherike. Devê “xerafê” fireh dibe.. bi

çavekî tijî kîn li wî dinhêre, “Min bernede.. lingên min bigre û bernede”. Lê lingên ewî bûne du mar û xwe li wî alandine û bi jêr ve dikişînin û dihêlin ku ewwan ji nav destên xwe bişimtîne.. “min bernede, ez ke.. ayy”. Dengê ewî hevalî ji hundur xerafê tê û sola ku, di dest wî de mayî, bi devekî zengarî û tijî didanin mîxî dikene.

kurteçîrrok

- 77 -

BÎRANÎNA ÎRO

“Bîst sallin ku, di ser bûyaerê re derbas bûne, îro ez dûrî xerafê û bi çend gavan meşîm, lê bi bihîstina bulqbulqa ji hundurê wê, min çav ber bi wê ve badan û.. mîxekî zengarî wan dikizirîne û.. ez direvim. Lê kenê ewê solê, ji pey min venagere.”

Heleb, 92

SEDEM

(1)

“ -Xwedê û ya elah, ez a kût nikarim rabim ser xwe; çawa evî kalî, ji pîsîtiyê paqij bikim”. Senem navkuta dide dilê xwe, lê hêz û teqet nemaye; pîre-jineke ketiye, salên wê ne kêmtirî heftêne û êş û diwariya jînê hêştî ku, heftê saliya wê gotina xwe bêje; hertim û tim li karê xelkê û îro û piştî evan salên dirêj ji kar û mezinkirina kurteçîrrok

- 78 -

zariwan, kurên wê dev jê berdane. Dema baskên wan bi perbûn, her yekî zar-zîçên xwe revandin û ji bilî yê biçûk li cem nemaye; raste derî di derî de ye, lê ji tirsê pîreka

xwe re, ewî newêrî ji dê û bav re bigota: “êvara we bi xêr be.”

Senem di jiyana xwe de hatibû nasîn, weke jineke çeleng û bermalî. Lê gotinên sala jî hene û ev bûne deh roj û ew di nav nivînan de ye; bi velîstina ling re, ew kût dikeve; laşê kale-pîran weke dara kurmiye, bablîskeke sivik diqurifîne, Raste ew hîne ji berî di nav nivînan keve ketibû, lê bi kûnxuşa ewê bermaliya xwe radigirt. Lê evan deh rojên dawî, bi wan, gelekî dijwarbûn; pirê caran kesên gund xwarin ji wan re tanîn û carna jî ku, bûka wê ji mal bi derdiket, keça wê ya berwîl; Gulê û bi dizî, şîv û nan dida ber hembêza xwe û derbas cem wan dikir û ji ber evê yekê, wê pir êş û serpêhatî, ji diya xwe, didîtin.

-Gulê.. uh.. uh.. . Senemê deng li keça kurê xwe kir, lê nexweşiya “rebo” ne hêşt ku, gotinên xwe bibe serî, ew kuxî û deng jê hate birîn.

kurteçîrrok

- 79 -

Bi zor û zehmetî, pişta xûz ji ser balîva hilanî, bihin bi qelesî berda, şal û desmala ber eniyê ji ser hev şelîne, porê reş û şîn li ser eniyê belav bûye û bi tiliyên dilerizin û sed fûtî heya ku, karîbû li hevdu badana.

-Lê Gulê.. uh.. uh.. . Banga dudiwan hildide.

-Aman vê pîrê ji me xêre, namirin û em ji wan xelas nabin.. herduyên din çûn bajêr û ev telamina bi ser min de man. Bûkê dengê xwe bilind kir; nema ew ji kesî ditirse; piştî şanzde salan ji kulfetiya xwe, dît ku, mêrê

wê ne ew kesê ku, kare dengê xwe lê bilind bikêye.

-Lo gundo.. uh.. uh.. min gul-guyî, uh.. hi.. we  
xwero.. uh.. uh.. gundo. Pîra ketî diqîre.

-Dêh.. dêh, te guh da vê ceziy.. bes mayî ku, gund li  
me kom bibe. Kuve.. tu bi kuva derî, vegeer hundir.. yala.  
Dema ku, dibîne Gulê ber bi deriyê kal-pîrê diçe, ew  
deng lê dike û dihêle ew bi xemgînê vegere hundir û  
hêsiran hûrik-hûrik bi barîne.

Senem ê hevî ji hawar û amanan birî, lingên xwe  
kişandin, êşa giran hêşt ku, qêrîn pêkeve. Ewê dizanî  
ku, nikare rabe ser xwe, lew re dest dan erdê, da ku,  
xwe bi kûn-xuşkan bighîne misînê avê û herî nik kalê  
kurteçîrrok

- 80 -

xwe û wî ji pîstiyê paqij bike. Serpêhatiyên wê îro  
zêdetir bûne; bi nexweşketina kalê wê re û pêsîbûna wî  
di bin xwe de.

-Tu tima ji nav nivînan bi dertetî metê. Keça birayê  
Senem ê bi hundir dikeve; jineke navsal û biye. Di gund  
de bi “bûdele” yê tete nasîn.

-Metê çî.. uh.. hi.. gûyî buxe.. uh.. kal bi xwe, uh..  
hi.. hi.. de pîs bûye û kes tine.. hi.. bişo.. hi.. hi.

-Û titê bişo, labe nav diyê hwe. Zimanê wê li ber  
gelek tîpan dimîne û ew nikare wan bi renekî durist  
derîne. Wê, meta xwe xiste nav cih, rahişt legena avê û  
kal û cihê wî paqijkir û di ewê hîngê de dengê  
tirimbêlekê dikeve guhên wê û piçek naçe, ew li hewşê  
dirawestê û kurê meta wê yê mezin û pîreka wê jê peya

dibin.

-Selam û elêkum, têbê bênek nexwaş ji hundir tê..  
çiyê hev. Rûto dipirse.

-Kalê we bi xwe de pîs bûbû. Dilê pîreka Rûto  
veciniqî û awirek da mêrê xwe, lê dema bihîst ku hatiye  
şûştin, dilê wê hinekî rûnişt.

kurteçîrrok

- 81 -

-Êvara we bi xêr. Bi riwekî tal û tirş mîna encûrên  
keran, Elo gotinên xwe pijiqandin.

-Kîne hev.. uh hi.. . Pîr dipirse.

-Anê ezim. Salên Rûto pêncî hene; por û simbêl  
gewr, rû qerimî û sare, nemaze piştî ewê bûyara ku,  
hêşt heyvekê di nexweşxanê de rakeve û ewê hertim  
seqet bimîne.

-Halê me.. hi.. hi yî li ber çava ye.. hi wek tu.. uh..  
dibînî, ka.. virde we.. hi.. uh.. re, ez lawî xwe.. hi.. uh..  
maçkim. Ê ew demeke dirêj kuxî, nefes û deng jê hatin  
birîn, hêştin ku Rûto biçe nik wê.

-Kî bi te re ye.. hi.. ne Elo ye.

-Er..ê erê ezim, tu rihetî.

-Xwedê.. hi.. hevalê we be.. uh.. û ew amenetî.. hi..  
xwe bibe.. hi.. ew ji giştî çêtire.. uh.. ji me re.

“ -Amîn” . Elo di ber xwe de got û di van deman de  
deng ji kalê nehat, ji bilî ax û nalînin kûr; ew dilborî  
ketibû.

-Elo zû bilezîne, tu û vê bûdelê malê birevkin, heya  
ku, ez jî tenekeyên zêtê dikim tirabêlê, tiştêkî li hundir



nehêlin, bila ev seg bi ti tiştî şa nebe; evê ku, dê û bav  
kurteçîrrok

- 82 -

di bin çengan de, di vê rewê, de bihêle. Dema çavên  
Elo li mal û zêta kal-pîrê ket, dilê wê germbû û bi lez  
destên xwe vemaltin û tişt birefikir.

-Anê.. ez kê te û bavo bibim bajêr.. cem xwe, tu çî  
dibê; li wê derê em dikarin xizmet wekin û bijîjk.. yek  
dikare çî demê bê wan bîne.

Pîra Senem û Elo ketin pêşiya pîk-abê û Rûto bavê  
xwe di sindoqê de, li ser cihekî, dirêj kir. Ji gund bi  
derketin, bêyî ku, xatir ji gundiyên xwe bixwazin, digel  
ku, carekê-dudwan pîrê xwest deng li cîranan bike jî, lê  
Elo ferman da ku, ew bi rêkevin.

Gulê ji hundir bi derket; cara yekeme gotina dê  
dişkîne; dema ku, jê xwest dernekeve û tenê karî  
destên xwe ji ewana re bihehîne. Ew bi rêketin, hêsir  
hatin xwar û banga wê di bin dengê pîkavê de vemirt.

(2)

kurteçîrrok

- 83 -

“Rîng”, deng bi zengilê derî ket, Misto hêdî rabû çû derî  
vekir, lê hîne ji berî ku, ew derî veke jî dengê bavê xwe ji piş  
derî ve dike.

-Zû bang li birayên xwe bike û em vî tiştî derînin jor.

Rûto ji kurê xweyî biçûk xwest, Misto jî bi rola xwe deng  
li kesên hundir kir û tev daketin zukakê. Çiqina pîra  
Senem di paşela Elo de, ji gund heya bi Helebê, germ

bûye.

-Anê ka ji ber teva wê çiqinê hilgirim. Keça Elo jê xwest.

-Na.. na, her alî birayên xwe, ev sivike.. ez karim hilgirim. Elo bi nerînekê re, hejmara wan derxit, weke dibêjin: ew “di çewêl de, kunciyan dêjmêre.”

-Henê, we çi xwarin çêkirî. Elo pirsî.

-Hûn birçîne.. zar. Keça wê dipirse.

-Ê te nedîtî, em ji loqinta bavê te tîn û ji goşt têrin.

-Te xêre dîsa, devê te nakevê hev. Rûto ji pîreka xwe re got.

-Uffî.. îî xwedêkê gotinên te ji min ne kêmin, hertim emê li we heyrîne.

-Tu çi dixwazî, em wan çekin.

kurteçîrrok

- 84 -

-Û tu bi tena xwe ji wan.. ji pêşiyê de, em dîkin û xeynî me jî duxun. Ma Memo û Heso jî ne jêne, ew milkmewêl bibin, em jî derd û kula bikişînin.

-Hele yek.. uh.. hi.. xêra bavê xwe.. uh.. hinek av ji min re.. uh bînin, bi Xwedê.. uh.. ji tîna re balmîşbûm.

-Li cem kal-bavê min, ya paşin be. Elo di ber xwe de got.

Êvar li wan dahat, Rûto salix da kurên xwe yên ji mal cihê û ew bi şev li hev kom dibin û hundir ji deng û qîrçira dixilxile; sê-çar nifş dighên hev û kes dengê hev nake.

-Misto.. nuha dema te û tilivizyonêye, vemirîn. Rûto

deng li kurê xwe yî biçûk dike.

-Senem.. tu li kuyî, kes tineye ku, tu wî bişînî mala Hemo; bila ji min re kulmek şîr bîne, wele gewriya min ziwa bû. Di baweriya kalemêr de ye ku, ew hîne li gundin, lew re ji pîrejina xwe dixweze ku yekî bişîne mala cîrana.

Te dengê bavê xwe bîst ku, çiqwas saxe, evê pir kul û derdan bi min xîne. Bi Xwedê wê salekê di nav nivînan de bikişîne û ji bilî min kes wê netê nik wan jî, kurteçîrrok

- 85 -

me çi derd ji xwe re çêkir. Elo got û careke ew çiqina ku ji gund de xistibû paşela xwe û hîne dernexistibû peland.

-Gotina te ye anê, dema me ji tirambêlê danî, min bawer nedikir ku, emê wî bi hundir gihînin û a nuha xwarinê dixwaze. Deng bi lawekî wê dikeve.

-Kes tiştî nedinê, ne dûre bi xwe de pîs bibe, kesî wî bişo tine ye. Elo ewê bihna ku, li gund kiribû bi bîr tîne.

-Çawa tiştî nedinê, bila ew ji nêza re bimire, me çima ew anîn. Rûto vegerand.

-Eger ku di bin xwe de pîs bûn, tu yê bişo.

-Çengê zêde negerekin. Rûto bi bihintengî li pîreka xwe vedigerîne.

-Êdî şerme bav, diya me bi porê sipiye; ev ne li gor wê ye. Kurê Rûto yê mezin li bav vegerand; ew kesekî xwedan nimêj û misîne, lê dema ku mala wan li gund û wî li bajêr dixwend û li cem jinebiykê odayek kirêkiribû,

bi roj jê re digot: “anê” û bi şev jî dikete nav nivîna wê.

-Eger ku tu ewê yekê zanî, gereke tu ya din jî zanibî;  
ma çêdibe ev kale-pîran birçî rakevin. Rûto gote kurê  
xwe.

kurteçîrrok

- 86 -

-Misto.. ha ji te re peran û here şîr û sêvina bîne.

Lawê Rûto yê mezin hinek pere derxistin û dirêjî birayê  
xwe dike.

-bila ew bide, ewî ku evqasî ji ber wan ve dixeyide.

Elo got.

-Ez kîme, ew kiye.. .. nuha we ev anîn, wînkê çawa  
derdî wan bikişînin. Ew pirs nişkabûnekê bi tevan re  
çêdike.

-Ji bavê xwe bi pirse.. bi Xwedê ez vî kevçî ji vir  
nadim dest wan. Bi gotinê re destê xwe dirêj pêş xwe  
kir. Ê kesî sibê-êvarê bêhnê dermên û ix-puxê wan  
bikşîne tineye, bila wan bibe mala Cimo.. ewê boşe û  
ew bi xwe jî kanê li cem xewke.

-Bi Xwedê ev raste, bav diya min rast dipeyve.. wir  
valaye, eger ku mêvan bên an bijîjk ti kes li wan  
nahyre. Cimo kurê Rûto, ewê hîne cahil malek ji xwe re  
kiriye.

(3)

kurteçîrrok

- 87 -

Piştî du rojan Memo bihîst ku birayê wî, dê û bav, tev  
mal û mewal aniye cem xwe û ewê yekê hêşt ku, pîreka

wî jê re bibêje: “wan dê û bavê te anîn, lê çima malê rêşdikin”. Bi boneya evê yekê wî soz da ku, pêle cem wan nake, lê dema bihîst ku bavê wî li ber candanê ye, soza xwe xwar; kela wî ya dimisê ye.

Mala Cimo li qata çara ne, dive mirov bi şêst û şeş pêpelokan bi banî bikeve; bi zor-xweşî dihêle yek ji Xwedê ve nîzîk bibe. Ew ji du odan û xizmetxanê wê hatiye avakirin. Cimo tiştên xwe xistine odeyekê û derî li ser girtî, cil û nivînek ji yên Senemê rêxistine û kal di nav de danîne.

Piştî ku ew hinekî bihna xwe dertîne, destê xwe datîne ser bişkoka zengulê derî û piştî rawestandineke dirêj. Rûto derî vekir.

-Êvara we bi xêr.

-Bi xêr û silametî, keremke. Piştî li dem û rewşa hevdu pirsîn û Senem ê eniya kurê xweyî orte maçî kir, dest bi giriyê xwe kir.

-Anê tu çima digrî. Xwedê heye xem tune ye, Memo got.

kurteçîrrok

- 88 -

-Şukir ji wî re.

-Kulkê teyî bi xêr be, tu bi xêr hatî.. çima wilo bilez hatî. Rûto henekên xwe bi Memo dike.

-Eger ku bira wek te bûn, ezê wilo zû bêm.

-Ev jî ebra ser nîvkêlê ye.

-Ma we kê salox da me ku, em werin, min ji devê xelkê bihîst. Dev tişteki dibêje û dil titeki din; Rûto jî nas

kir ku, ew derwan dike, qehra wî ji anîna mal û zeytê ye, ne ji derengiya gihandina saloxê ye.

-Gişkî berde, we bijîjk anî ser, an.. na.

-Tu çi dibêjî, ev bû du rojin ku ew li virin û hîne bijîşk ne tên ser. Ewê ku ew derman kiribûn jê re gotibû: "Divê hûn wî bibin cem yekî pispors", lê Rûto xwe ji bîr ve kir û ew gotin avête pişt guhê xwe.

-Bavo xew kirî, Memo pirsî û bi dengê wî re, ew şiyar dibe, çavan bi zor vedike; şelmût, ked û êşa heyştê salî jê diherike û ewan hêştîye ku, bijang hevdu bernedin. Kalemêr seriyê sipî, mîna çiyayên bi berf, ji ser balîvan radike, gewriya wî bûye guhanên pêz di demsala zivistanê de û gotin jê nayên.

kurteçîrrok

- 89 -

-Tu hat.. me ra li bavê xwe napirse, tema tu yî dibînî ku, ezî ketime doşeka mirinê.

-Ê ne yekiyê salox bida min.. tu çawa yî.

-Aman wek tu dibînî; lingekî min li vir e û yekî li axretê ye, Xwedê û pêxember ji Huso ne razî be; wî ez gihandim vî halî, eger ku wê rojê ez di bin baranê de ne çûma êş, ez ne diketim vî halî, lê tu yê çi bêjî mêrê tirsok, ewê di derpiyê jinekê de mexeliye.

-Ê.. ê dîsa te ji.. uh.. wan xêre, tema tuyî li ber.. uh.. hi.. candanê ye. Ji berî evê rewşa dawî ya kalemêrê xwe, ev gotin û xwestina han, bi Senemê gelekî sivik bû, lê roja îro û piştî ku, dibîne ew ketiye ber candanê, gotin lê zor hat.

-Dîsa vê caziyê xêre, aman çî dixweze, eger qîçik li porî teyî sipî birîn, dîsan jî tuyê bibê Xwedê ji wan razî be. Kalemêr her di nav peyv û peyvê de bihna xwe ber dide.

-Tu tim li ceme. Memo ji Rûto pirsî.

-Tim, carna dirim mizgeftê û ew bi tenê dimînin.

-kilîtekê bide min, divê ez werim û tu ne li malbê.

-ji bilî yekê li cem min tune ye.

kurteçîrrok

- 90 -

Memo tê derdixist ku, ew naxwaze kilîta mala Cimo bide wî, heya ku, ew bi tena xwe bi wan re rûnenê û di pişt re xuya bû ku, xwesteka wî di cih de bû; gelek caran ew û zarwên wî dihatin derî dikutan lê kesî derî venedikir, bihîstina kal û pîrê ji dangan re qelse, toz û telaza benderan û rêçikên pezan, di ewan salên dirêj de, xendekên guhên wan xetimandî, nema gotin û deng karin riya xwe, di hundirê wan re, bi qeliêşnin.

Bîst û çar roj, ji hatina wan li Helebê qediyan, şeva bîst û pêncan, Rûto derî li ser wan digre û diçe mal; ew îro gelekî bi xeme, dive ew û Elo, digel kurê xwe Cimo û çend kesên din herin mala Biro ku, qelengê keça wî li ser Cimo bibirin.

Bi hev ketin, bi şahî li hev rûniştin, heya Memo ji van tiştan tineye, tev kulfetê xwe, li ber deriy, Cimo ne.

Zengil dikutin, ji berî ku ew li derî bidin bi piçekê, kal bi zorê çavan ji hev dike û dengekî li pîra xwe dike.

-Senem.. Senem.

-Him te xêre, çi ji min dixwazî.. uh.

-Gewriya min ziwa bûye, gulmek av bide min.

Dengekî qelse, ziman giran bûye, li gor jîna dirêj a ku,  
kurteçîrrok

- 91 -

qedandine û dîtina gelek kesên di ber candanê de,  
herduwan dizanî belkî ev gulma dawî be. Senemê  
Xwest rabe ser xwe, lê kabkuliyan negirt, di cih de ket,  
bi kûn xweşa xwe gihand ber avê zerik bi avê xwist, lê  
dît xir-xira gewriya kalê tê, sêvika gewriyê bi zor hildide,  
ziman dirêj dibe, ji dil de deng li Xwedê kir ku, canê wî  
piçek din bihêle û zerika dawî bide dest wî, nê û xuwê  
li hev helal bikin, lê xwestekên wê bê guhdan têtin  
pelixandin. Seriyê kalemêr hate badan, diran dizimên de  
çûne xwar û bi ser balîvê xwe de diqulibe.

Memo ji ber derî bi rê dikeve, Senemê dest avêt  
ruwê Kale-mêr çavên wî girtin, xwest diranan ji zimên  
derîne û têxîne dêv, çenê li ser bide hev, lê karekî zor  
dît, bihnek nexweş kete bêvilên wê, şûşeyê bihnê ji  
paşila xwe bi derxist û li ser rû û candikê wî reşand.  
Şûşeyê bihnê bîranîneke kevin anî ber çavan; dema ku  
kurê xalê wê jê dixwet ku, ew ewî şûşeyî bigihîne  
dilbera wî, lê ji qeşmeriyên jînê û li şûna hevala wê evê  
rojê bibîne, vaye îro ewê li ber seriyê wî rûniştiye.

“ -Gelo, rast ev çerm û hestiyên li pêşiya min, ên wî  
xortî ne, keçên gundê me tev li hêviya nerîneke wî bûn.

kurteçîrrok

- 92 -



Jîna tal te ji stûnê mal, ti tişt nehîşt; mîna kurman kete hundur hestiyên wî û ji êlekê ve xwar.. xefaret Xweda ji kufriya min. kêfxweşiy mala Biro bi derngî bi dawî tê, bi ken û çepik ji cem bi rê dikevin û Rûto û mazûvanên xwe riya mal digrin.

-Ezê herim seriyekî li kal-pîran xim. Rûto got û xwest wan berde, lê Elo xwe da nik wî; şahiya îşev şevin xweş û bi gewz anîn bîra wê, xwest ku wek berê seriyên xwe bidin ser balîfekî. Raste ew ne ciwanin, lê damarên wê hîna ziwa nebûne, Rûto dev da nav nivînan.

Tîrêjên rokê tariya şevê revand, xelkên bajêr şiyarbûn, ji nav nivînan, ji hembêzên pîrekên xwe dikişin. Rûto dev û lêv xistine nav memikan; belkî piçek gewzî ji jînê bidize, lê katijmêrê nehîşt ew mêtina xwe bibe serî, zengilê wê mîna çakûçan di seriyê wî de diçe xwar, bi zor û zehmetî xwe ji ba pîrekê kişand. Derî vekir dît ku, dengê dê mîna nalînên birîndarê di benê werbûbû û mitê dara sindiyanê ku, dipiştê re serî hildabû, dengê wê ji kûranyê ve tê.

kurteçîrrok

- 93 -

(4)

Salox gihişt hemû xisma, ew kom bûn, di nav xwe de gerandin, dê çawa bikin, ên pir bi neçûna gund re ne, raste temiya Kale-mêr ku, di nav bavkalên xwe de bê veşartin, lê demê çavên wan bi dereve dikevin, bi birûsk û baran û req-reqa ewran, temiyên wî cihê xwe di dilên

kurên wî de nabîne, gelek ketijmêr borîn, heye ku,  
termê wî hate şuştin û li ser hat nimêjkin.

Kale-mêr li ser çar daran danîn, hêdî-hêdî bi rêketin,  
xwendina (fatîha) qêrîn û giriyê xisma bilindkir; pîreka  
Rûto ya Memo xwe qotkirin, hawar-hawara wane.

Girî, qêrîn di gewriya Senemê de bûye çiqina maran,  
deng jê dernayê, rundikên zelal weke ava kaniyan di  
xendek û geliyan re diherikin, di riwê ku, bi xencerên  
salan hatine qelaştin û birînên kûr li şûn xwe hêştine re,  
diherkin û zû-zû ew têtin vemirtin; di axa ziwa de tavên  
biharê wenda dibin.

Ji devê avahiyê bi derketin, kesekî gotinek got û tev  
di cih de rawestîn, lepên xwe bi jor de vegirtin, dev livîn  
kurteçîrrok

- 94 -

û dest di ser riwê xwe re xuşandin, tabût li tirmbêlekê  
siwar kirin û dane dû hev, piştî demekê ew li Goristana  
Henên radiwestin. Xemgîn kurê Memo mat ma; wî  
naskir ku temiya kale-mêr, a dawî, li erdê ket û ew di bin  
kerikên solên xwe de perçiqandin.

-Bav çima em naçin gund û em temiya bavkalê xwe  
bi cih neyinin, me salox nedayî amê min Hiso ku, emê  
wî li vir veşêrin, soza me ku em herin wî li gund veşêrin.  
Xemgîn dixwest ew biçin gund û çûna xwe weke  
keysekê didît, da ku, Gulê; keçama xwe bibîne.

-Ev ne karê te ye, ma tu baranê nabînî û tu bi xwe  
riya gund nasdikî ku, ew çiqas pîse, ma tu dixwazî  
bûyerke din bi me re bibe. Xemgîn devê xwe girt, ew

wilo zû-zû dêv nagire, lê dît gotinên wî, dê bê sûde bin.  
Gora kale-mêr amade kirin. Xemgîn ji ba bav bi dûr  
ket, xwe li şûna mêra girt, yek pîrek jê derbasbûn li  
hêviya diya xwe ya pîr; Senem e. Ew pişt xûz û bi  
gavine koseyî mîna ku, yek di xew de be û bimeşe. Ewî  
xwe lê girt, tîrêj û awirên pîrekan li wî ye, bi destên wê  
digire û dema ew çavan hildide dibîne ku, baweriya wê  
di cih de bû.

kurteçîrrok

- 95 -

Cendek bi lez ji tabûtê bi derxistin, cila mor ji ser  
avêtin, kefenê sipî firî û kete çavan, qêrîn bi bûkên  
Senemê ket û deng li hev kirin, dema wê dengê wan kir  
seriyê xwe hilda û bi dengekî bilind kenî.. kenekî bê  
reng, çavên hemûyan lê bû, lê ewê kenê xwe nebirî.  
Rûto bi çepilên wê girt û ber bi tirembêlan kişand, wê  
xwe bi erdê ve kir şima, xwest rakêşe, dît çavên tevan li  
wane. Hatina Xemgîn.. pîrejin ji nav lepên wî derxist û  
ewê serî xiste sîngê wî û azirî.

Ew veşartin, mele dest bi telqînê kir û dîsa tevan  
destên xwe bi banî de vegirtin, di navbera her çend  
gotinên wî de, ewana peyvek digot, peyveke bi tirs û  
dilgermî û dema mele karê xwe qedand, her yek rabû  
ku, li termbêla xwe siwar be, lê hêsirên ezmên bileztir  
bûn; ew û gora kalê şilkirin.. qêrîn û req-reqa ewran,  
tirsê dixê dilê wan û gelî bi xeyd zikê xakê diqelişîne.  
Xemgîn ji diya xwe ya pîr dixwaze ku rabin, ew  
destmala ber eniyê rêdixe, lepek herî ji gora kale-mêr

hiltîne û dixe navde. Ewana dev dane Helebê, her yek  
bi raman û rewşa xwe de mijûl ketiye.. dixwazin bilez  
vegerin ser karên xwe û pireka ev roja sar weke  
kurteçîrrok

- 96 -

keysekê dîtî ku, vegerin hembêza pîrekên xwe yê  
gerim, bi tenê pîra Senem, hişê xwe li şûn xwe hêştiye.

(5)

Yek meh di ser mirina kale-mêr re buhrîn, pîra  
Senem di navbera herdu malên kurên xwe de diçe û tê.  
Kanî bajar ji gund; di dawiya jîna xwe de ketiye zindanê,  
ew rojên gund ku, dema banga dîkan ferman dida  
sibehê ku, ew konê xwe verşîne û şeva koça xwe barke,  
dengê zengilên mirêh û berana, kalîna berxikan, xiştxişt  
keyandina dêw û demê ew deng tevlî hev dibûn,  
gul di dilê wê de dipişkivandin. Tîrêjên rokê yek  
ramûsan ji bijankan distîne û xewê ji wan direvîne.  
Pîra Senem nema dikare di navbera çar dîwarên bejî  
de bijî, nemaze piştî koçkirina kalê wê; lewre ewê  
ferman da ku, here gund, lê gelo kanî mal. Ev pirs û  
pirekên dîtî di seriyê wî de lêdidin, lê dil bersivan ji mejî  
didize. Dema ku, ewê çêra gund kir, jê re negotin na, lê  
kurteçîrrok

- 97 -

kesî negot tu yê çawa bijî û bi çî û gava peyva tiştên  
xwe kir, erd û ezman bû yek, şemeta wan di gunhê  
cîranan re derbasbû.

-Çî.. çî tiştî çî, ev sûcê me ye, bes loma ji Rûto dîkin,

dawiya dawî em diz derketin. Elo di riwê Pîrê de kire qêrîn.

-Tiştî çî anê ku, tu dibêjî tiştî min bidin min.

-Ewê we.. uh.. ji gund aniye.

-Me çî an.. hi.. çend dest pirtiyên te hebûn, ferefûlkê te çî hebûn. Elo dîsan qêriya.

-Eger tiştî me.. uh.. tinebû, em çawa radibûn û rûdiniştin, we ji.. uh.. bilî pera û zêtê.. uh.. mal tev bir, ez nabêjim.. uh.. ka pera û zêtê, bes.. uh.. pirtiya û ferefûlka bidin min.

-Ne te hana kir, bi Xwedê rojek bi tenê jî te li ba xwe nahêlim, here.. kuva derî her û tiştî te li ba me tine ye.

-Bese ji te re, eger diya min bixwaze dê li cem min bimîne, na ku, xwest here gund kêfa wê ye, ew jî kurê wê ye.

Elo dît ku, mêrê wê gelekî zana derket û wilo dê du çiv,kan bi kevirekî re gêrbikin; hin tişt bibin û hin jî dê ji kurteçîrrok

- 98 -

pîrê xelas bin, lewre dengê xwe nekir. Pîra Senem dît gotinên wê bê sûde ne, çiqina cilên Kale-mêr û lepa heriyê kirin bin milên xwe. Rûto rabû ser xwe, da ku herê wê bigihîne tirembêla gund, lê Pîrê dest da pêş wî û rê li ber girt.

-Na, naxweze.. uh, ezê niha.. uh.. herim mala Memo û Xemgîn dê bi min.. uh.. re here gund.

“ -Ev jî başe, peryên rê ji min re man, ma Memo jî ne kurê wê ye”. Bêyî devê Rûto ji hev bibe wî gote xwe.

-Pîr ji hundir bi derket, ewê ti gotin negotin û ji bilî Rûto û zarên wî yên biçûk kes nehat ber derî. Senem li kurê xwe zîvirî, xwest ewê hembêz bike, weke çwaw ku di çûkaniya wî de û dema ku, ew ji ber zarên cîrana direvî û dihat xwe di hembêza wê de vedişart, lê dît seriyê wî ji hembêza wê mezintir bûye û ewê xistiye ber xwe de, çavên xwe ji erdê nabire. Ji cem bi rê ket bêyî ku, tişkî jê re bibêje.

Pêpelûk pirin.. kûrin, hilm li Pîra Senem birîn, bi gelek cih rûnişt û piştî demeke dirêj ghişte zukakê, bihna wê firh bû, xwest her tiştî di bin çavên xwe re derbaske, bibeze mîna kesên girtî û nûh ji zindanê kurteçîrrok

- 99 -

hatibe berdan, lê di cih de dil derizî, nûha pîreka Memo dê gelek xeberan jê re bide, lê çî bike; ewê nehişt ku, Rûto wê bigihîne tirembêlê û nizane bi tena xwe jî li bajarê Helebê bigere, belê Mala herdu kurên wê li taxekê ye, lê dema ew ji malekê diçû ya din kurên wan ew bi xwe re dibirin.

“ -Min bûdelê çawa negot: yek min bigihînin wê derê, ezê çawa mala Memo derînim” Senem bi evan ramanan de ketibû dema ku, Xemgîn den lê kir.

-Tu bi tenê kuva diçî yadê.

-Wey qurban seriyê lawê xwe.. uh.. bim, Xwedê tu ji min.. uh.. re şand, ez.. uh.. dihatim cem we. Çavên Xemgîn li çiqena bin milan ket, naskir ku, tişteki nuh heye.

-Dê meşe em herin, tu dizanî ev rê diçî kuderê.  
-Ji kuve zanim, çima.. uh.. mala we ne li vî alî maye,  
ne.. uh.. tu ji mal tê. Xemgîn berkenî bû.  
-Na ka çiqenê û hêdî-hêdî em herin.  
-Na kurê min, ez.. uh.. dihatim cem we.. uh.. ku, tu  
bi min re herî.. uh.. hi.. gund.

kurteçîrrok

- 100 -

-Tu dermên venaxwî; bala xwe didimê ku kux û  
bîhnberdana te weke berê vegeriya ye.  
-Derman ji yê weke min.. uh.. re bê sûde ye, kurê  
min.. uh.. uh.. here saloxê bide mal, bila zanibin tu bi..  
uh.. min re çûyî gund û.. uh.. dakeve em herin.  
-Tuyê li cem me be. Xemgîn nasdike ku, xwesteka  
wî dijware û bi cih netê, lê nayê mêjiyan ku, ev here  
gund, ewê çawa bijî û bi çî, mala wê tev birine û ewê li  
gund jî dê jê re bêje: kê mala te bir bila te jî bibe.  
-Na.. na, here bêje û vege. Ew di hevpeyvîna xwe  
de bûn gava tirembêleke sipî wek pirûskê di ber wan re  
buhirî, hêşt dilê Pîra Senem ji sîng bikeve û ji Xemgîn  
xwest ku, xwe ji ser rê bide alî û careke jê re bêje:  
Bilezîne here saloxê bide mal. Ewî dît gotin bê çare ye,  
piştî katekê wan riya gund girtibû.

(6)

kurteçîrrok

- 101 -

Katjimêrê parek ji dîrokê şewitand û ji berî ro here  
ava; koça xwe bar bike, ew ghiştin gund. çavên wî û

riya gewr ketine evîneke giran, lê hîna evîna gund û dil bêhtire, xaniyên axî û bi dîrek, kozên berxikan, mizgefta nazdar.. kesên gund, tevan xwe avêtin çavan.

Tirimbêla bi tenê ya ku, gund bi bajêr ve girêdide li pêş mizgeftê rawestî, kesên gundê Çeqela jê peya bûn. Gava lingên wî ghiştin erdê xwest ax û keviran hembêz bike, lê fedîbûnê ew girt, kesên gund derketine ser ban û sewkiyan; temaşeya evên ku ji tirembêlê datên dikin, ka xismên wan di nav de hene yan na. Xemgîn çav gerandin, ezman reng rengî ye, rengê aravî cihekî mezin di rojava de girtî, kevokên ku anuha di ewî alî re difirin, pê hatine şuştin û di jorî wan re yek pariyên sipî, ji ewran, di riwê ezmên re dixuşin, di binde jî gundê Çeqela, bê deng di hembêza çiyar de raketî, lê hatina tirembêlê ew ji xew şiyar kir. Xemgîn dest di piştta pîrê re bir û ji milan de ew hembêz kir û hêdî-hêdî daketin mala amê biçûk, rê ji Pîra Senem re gelekî zore; malên gund di zikê gelî de belav bûne.

kurteçîrrok

- 102 -

Ji berî ku, Rûto mala Pîrê ji gund bibe, ew mişt bû û piştî çûna wan, Hiso gotinên pîreka xwe bi cih anîn; “Ma tu jî ne ji wane” û ewî jî çî tiştê ku, li şûna ewana mabû ji xwe re bir û ode jî ji zarên xwe re seyand û wilo derfet jê re çêbû ku, di çî demê de be ew li stûyê pîreka xwe ne û ne weke berê ku, divyabû heya zaro razin û pirê caran ew ji berî ewana dirazî û wilo ew şev bê ser şuştin derbas dibû. Ê vaye Xemgîn û Pîra Senem li pêş derî



rawestîne bêyî ku zanibin ewê çibkin.

Xemgîn kurê Memo yê mezine, salên wî bîst û çarin,  
li zanîngeha Helebê dixwîne, kesekî jar û qelese; mîna  
tajiye nêçîrê por û birih reş, evîndarê Gulê ye; keça amê  
xwe, hatina îro ji wî re ne ji bo dîtina Gulê ye, lê tevî  
ewê yek jî û her ku, gavên xwe ber bi mala amê xwe  
davêtin dil bêtir lêdide, destek daniye ser qefesa sîng;  
tirsê wî ewe ku, vemire.

Piştî demek dijwar û bi jan ku, bi rê de dîtî, ew  
ketibûn hewşê, pîreka Hiso ya ku, li ser kale-mêr dikir  
hewar, girarê dên hildibjêre, çavên wê li wan dikeve, rû  
tirş û tal dibe û awirekê dide wan. Xemgîn naskir dê roja  
wan ne bixêr be, ramanên wê jî, jê re digotin: “hatina  
kurteçîrrok

- 103 -

evana ne bixêre, tiştêk bi wan re heye.. . Ev Pîra cazî û  
ne bixêr dîsa vegeriya, bi Xwedê ti tiştî nadimê, çima  
ewê mala xwe bide yê mezin û ezê rabim derdên wê  
bikişînin”. Ew ji cihê xwe nelivî, wek kesê hevdû nebîne,  
ewana silav lêkir, lê deng bi ewê neket.

Di ewan çaxan de Hiso li hundir bi zariwan re dileyst,  
dema dengên wan kete guhên ewî, ew ji cihê xwe rabû  
û derket. Raste ew yê biçûke, lê gava yek kurên  
Senemê bide ber hev, dê bibêje ku ew ji teva mezintire;  
por li serî nema ye, ji bilî çend mûyan di guvişkan de,  
ew jî sipî bûne, didan di dêv de nemane, cilên wî kevin  
û bi pîne ne, ew li dijî birayê xwe Memo ye.

-Ser seran, hatina we bixêr be.. Xemgîn keremke.

Hiso bi nizmî dipeyv, ewî dixwest bi hatina diya xwe şah bibe, lê ji gotinên pîreka xwe ditirse; erê gotinên wî bi tirsin, lê ji tîna dil têne der, ev bûye çend mehin ku, ewî diya xwe nedîtiye.

Ew bezî destên Pîra Senem, tilî ji rondikan şil bûn û dema ku, ewê xwest wî têxîne hembêza xwe, piştî xûz nehişt. Bi destê Xemgîn girit û silaveke germ lê kir û di cih de deng li Gulê kir ku, cih û balîvan ji wan re deyne; kurteçîrrok

- 104 -

şahiya wî hişt ku, tirsî pîrekê ji bîr bibe, bi bihîstina navê Gulê re û hatina wê ya bê pêjin, sîngê Xemgîn guvaşt û rû zer bû, mîna zarokê ku di dizîya zêtûnan de bête girtin, lê rewşa Gulê xerabtire; dilê wê tezî ye, nikare xwe li pêş pêlên wî bigire.

Gulê keça ciwan û perwîn, bi lez bezî nivîn û pirtiyên û ew avêtin erdê; gotnên bav dilê wê germ kiribû û tirs jê revandî, lê çiqwas rengên keskesorê hene, tevan xwest ku carekê li rûdêmê ewê bibin mêvan. Dema ew dikevin hudir, Gulê destê pîrka xwe diramûse û bi fedî ber ve Xemgîn çû, dest dirêj kir.. tev de diricifin, xunavên xwêdanê ew pêçane. Çavên ewana rastî hev hatin, keder û jana dil ji hev re gotin, bijng perda reş bi ser ewana de berdide û nema Xemgîn ti tiştî, ji bilî porê wê yî reş û mîna avşîtan ku, bi ser qirika wê yî zirav û xala nazdar de diherike û sîng bi du kaniyên çiya avdide, dibîne.

Xewna ji berî demekê hate bîra ewî; gava dît ku

Xweda û piştî şeş rojên avakirinê, rûnişt û li dora xwe nerî, bi ser xwe de ponijî û hest kir ku, tişteki ji bîr kiriye û nahêle ku, ronahî li ser evan afrandinên ewî, li kurteçîrrok

- 105 -

gerdûnê belav bibe û dema çavên wî bi Adem dikevin ku, ew mîna sêwî û siwêlekan di kucekî reş de rûniştî, ewê hîngê Xweda giriya û naskir ku, ewî ji bîr kiriye pêrekê bi afirîne û gava hêsir di kefên destên ewî de kom dibin, Xweda ji ewan hêsrên Hewa di afirîne.

-Xemgîn keremke. Dengê amê wî hêşt ku, ew ji deriya çavên Gulê û xewnan derkeve, Xemgîn bi lez bersiva amê xwe da, tevî ku ewî nasnekir ka pirsar wî çibû, lê texmîn kir ku, ewî li rewşa wî dipirse. Ew rûnişt û bi hêviya ku, amê wî ti pirsên dîtir jê neke, da ku karibe tîna dil, bi nerîna çavan û dîtina dilbere xwe, vemrîne, lê dengê jinama wî, ev gewza han jê dizî, gava ku, ji Gulê xwest bê û alîkariya ewê bike.

(7)

Cend roj ji hatina Xemgîn û Pîra Senem, ewa wan a gund, qediyar; tîna hev dîtîne sar bû, lê ya Gulê û Xemgîn qet sar nabe û di nav evan rojan de, gotinên kurteçîrrok

- 106 -

nexweş ji pîreka Huso û di aliyê guh yê dîtir re derbaz dibûn, nemaze piştî ku, ewê dît mêrê wê kela bîrîkiriya diya xwe, di navbera evan rojan de rijand û piştî naskirina ku, Rûto mal-mewal bi Pîrê nehiştî û şandiye

ser wana.

Reşî kete erdê, xelkên gund ji kar û şivantiyê  
vegeriyan malên xwe, tev zar-zîçên xwe li ber sifreyên  
xwe rûniştine. Mala Huso jî sifreya xwe û li bin  
qentereya di nîvê hundir de, legena kolikê, danîne û  
dew û pîvazeke bi girsiya kulmekê li ber ewana ye û zar  
hêdî-hêdî li heldorê civîn û yek parî jê dizîn, ji berî ku,  
ewên mezin cihên wan jê bistînin û evê yekê hêşt ku,  
bavê wan du-sê dangan li wan bike.

-Xemgîn.. anê, ma hûn mêvanin, naxwaze  
her tim ji were bêjim: kerembikin. Huso dengê li  
wan jî kir.

Xemgîn di ber xwe de peyivî û li çavên pîrka xwe  
nîhrî, dît ku yek hêsir de wn de ziwa bûne; ev dema êşa  
wan e, zor û kedera ewana di evan deman de; gava  
xwarin dadikeve bêhtir dibe û nemaze xwerina êvarê,  
kurteçîrrok

- 107 -

gava ku rê namîne ew xwe bidin alî û di qunceki re xwe  
veşêrin û piçin cihekî din buxin an jî demeke dîtir.

-Cima nayê bi me re naxwî. Huso deng li pîreka xwe  
kir û jê pirsî.

-Hûn buxwin bese, bila ez kuratiyê reş bixum.

-Ci heye dîsa, tu çi dimirî, çi ji te kême.

-Xwedêkê, tu çima nezane bipeyivî, çi ji me ne  
kême! Ji sibê heya bi êvarê, em weke keran dipekin, we  
kesî cara gotiye em alî wê bikin, bes hûn gurê xwarinê  
ne.

-Tu çawa dixwazî alî te bikim, ma tu nabînê ku ez sibê zû ji mal dertêm û êvarê vedigerim. Huso gotê.

-Ê bi Xwedê ez jî nikarim xizmeta malbatê tevî bikim, ez nikarim xizmetkim û xeynî min jî buxwin. Parî di gewriya wan de ziwa bû, bû ziqûm û çiqina maran, Gulê ji ser sifrê bazda; çû paşiya xênî û dengê giriye wê bilind bû, Xemgîn jî nizane xwe di kuderê de veşêre, ew ne dikare berdewama xwarinê bike û ne jî dikare rabe ser xwe, ew wilo di cihê xwe de tevizî. Tevan naskir ku kêr gihîşte hestî, Xemgîn rabû ser xwe, xwest ji mala amê xwe.. ji gund, ji cîhanê.. ji jiyane kurteçîrrok

- 108 -

bireve, ewî xwest ji çermê xwe derê, lê diya pîr hate bîra wî, dê di destê kêde bihêle.

-Xemgîn tu çima rabû ser xwe, çima tu naxwî. Dengê amê wî xeniqiye, nikare çavên xwe li yên wî rast bîne.

-Min têr xwar.

-Guh nede gotinên wê, ev mala amê te ye û wê ne ji mala bavê xwe aniye.

-Eger mal ne ya mine, çima ez weke kera dipekim, bi Xwedê hema piçekê jî li evan deran nasekinim, bila hûn li hev pîrozbin, eger hûn evqasî li ber Pîrê ketine. Ew di vir de bervê xwe ber bi Xemgîn dike û dibêje wî: çima hûn pîrê nabin ba xwe.

Xemgîn guhdarî nava xwe kir, gotinên ewê di cih de ne, lê mala wan ji ya amê wî ne çêtir e, diya ewî jî evan

gotinên wê dibêje. Raste heya ewê şevê pîreka Huso dipeyvî, lê yan di ber xwe de yan jî di nav cihê mêrê xwe de digot: “Bila diya te vegere cem ewê ku, pere û zêt xwariye”. Lê ewê şevê ti tişt di bin cilê de nehêşt, tev verîşand û bi awayekî sayî ji ewana xwest ku, cihekî xwe yî din bibînin û ew lê razin û.. dengê giriyê Gulê kurteçîrrok

- 109 -

hîna ji paşiya xênî ve tê. Şeveke reşe, ewî bi destê pîrê girt û derketin, dema Huso hat pêşiya wan û xwest ewana vegeerîne, Senemê çavên avdayî hildan ruwê wî û ji nuh ve bi riya xwe de çûn, bi zor-zor ew ghiştin ber deriyê Mala Çîlik û piştî ku, çend caran birê ve rûniştin. Çîlik birayê Senemê ye, kalekî navsale, navê wî li gor nihadên ewî hatiye; dema mirov li ewî dinihêre, bi hûnikiya dil hest dibe, hertim tu dikarî di çavên ewî de Xweda bibîne, raste eyarê dêst û ruwên ewî qermiçiyê û xendek jî bi qasî hejmara salên ewî hatine kolan, lê nehiştine ronahiya ruwê wî vemire. Dema derî ji wan re vekirin û ew ketine hundir, tev de mat man û piştî bihinvedankê û bihîstina çêrokê, Çîlik û bi ewê tîna xwe ya ku dikele, xwest here gevziyekê bide xwarziyê xwe, lê zarên ewî ew girtin û gotin: “heya sibe veyê, Xwedê vê re” û ewê zanibin çawa hesaba wî bidinê, lê hesabê cotarî û benderê li hev nehat.

Bi şev û piştî çend katan ji rûniştin û hevpeyvîna ewana, kevoka canê Pîra Senem di hundir de diperpîte, li ber seriyê wê kom dibin. Çîlik çend caran milên

xwûşka xwe hejandin, dev xiste guhên wê û bang li kurteçîrrok

- 110 -

navê Xweda kir, lê deng bi Pîra Senem neket, ewê tenê carekê çavên xwe vekirin û bi melûlî li dora xwe nirî û li ser wêneya rûdêmê Xemgîn rawestiya.

Dengê girî bilind bû, Çîlik bezî pirtûka “Quranê” û çend ayet ji bo canê ewê xwendin, bi dengê girî re gundî li ewana civîn û piçek neçû çavên Xemgîn bi pîreka amê xwe ketin, xwest here bera wê bide, lê ceger nekir, lewre ji mal bi derket û di dest ewî de pirtûka ku, herdem bi xwe re digerîne.

Sibeh li ewana dahat, her kes bi karê xwe radibe; hinekan gora pîrê amade kiriye, pîrekeke navsal û tevî çend jinan termê Senemê, di piş perdê de, dişon.

Xismên ewa mirî jî girî û lorandinên xwe didomînin û hin kes jî xwerinê, ji mêvanan re amede dikin û meleyê gund, pêş de, ber diranên xwe yên kurmî vedide; belkî çend pariyên zêde ji xwarinê di nav ewana de cih bigirin, lê Xemgîn li ewan deran nayê xuyakirin.

Li ser çar daran, bi selawet û girî gihandin goristanê, a.. ax bi ser kirin û mele telqîna xwe kuta kir, xisimên pîra Senem rêzgirtin û her kesê li wir seriyên wan xweş kirin, lê Xemgîn hîna xuya nebûye. Piştî tev vegerîn mal kurteçîrrok

- 111 -

û ser karên xwe, ew ghişte ser gora wê, lê hinekan got: ku ewana bi çavên xwe dît ku, ew ji hundirê gora Pîra

Senem bi derket. Ew bi neynûk û napirçekan bi gorê  
ket, ew veda.. heya ku, kefenê sipî jê ve xûya bû, dest  
avête paşila xwe û ew pirtûka ku, hertim pêre bû, danî  
ser sînga Pîra Senem û ji nuh ve ax bi ser de kir.  
Û Xemgîn ji ewê rojê de winda ye, li ser bextê hin  
kesên ku, li ser tirban mabûn, be ku, ew di dawiya karê  
xwe de bû kevokeke sipî û bi ezmên de firî.. winda bû.”

Heleb, 1989

\*\*

## PÛTVAN

PÎR RUSTEM

PÛTVAN

ÇÊROK

ji ya ku hespine rewan di asoyên min de bezandine;

ji Medya re

..... Dîsa jêre

Spasiyeke xasma ji koma dostên ku alîkariya min kirine re û bi taybetî ji  
xoşewîst K. Bêkes re.

Pîr Rustem

Di sala 1963 yan de li Çeqela/ Efrînê hatiye dinyayê. Heşt salên pêşîn li  
wir derbas dike û pişt re mala xwe bar dikin Cindirêsê. Destûrnameya  
xwendina lîse distîne û ji bo xwendinê, çend salên dawî li bajarê Helebê  
dimîne, beşa endaziyariyê dixwîne, lê di rêza çaran de dev jê berdide.

Pirtûkên wî:

Çivîkên Beravêtî

(Çêrok 1992 - Bêrûd)

Pilindir

(Çêrok 1993 - Bêrûd)



Herdu berhemên wî ji weşanên Kovara Aso ne.

Merx / Çêrok

Pûtvan / Pîr Rustem

Hejmara weşanê : 500

Wêneya bergê : Nîhad Turk

Çapa Yekem : 1998

- Weşanên Merxê, 1998

Mafê werger û weşanê yê Merxê ye.

Libinan - Bêrûd.

Sercem :

- Careke din hat.

- Pencere .

- Di nav destên yê mezin de.

- Çala reş .

- Wêne.

- Sing.

- Şikefta ketî.

- Qeşmer.

- Çûna veşerê.

- Pûtvan .

- Medya .

- 1915 .

- Çima..?

- Dilopeke Baran.

- Kek û Mam.

- Zayîn .

- Dîn zêde dibin.

Çêr Çêrok.

- Lawên Beko.

- Çend (û Çend) roj

Di jiyana pêximberekî de.

Careke din hat

Çend caran bi rê va ramiya; dikir ku, ji nuh ve vegere. Lê dema li zarokan dinhêre û kêfxweşiya wan dibîne, careke din , bi reya ku ketî ser de, diçe. Li navbera her kêliyê de dilê wî tê guvaştin. Ji duh ve, ji dema ku pîreka wî gotibûyê. “sibe î n e ka em zarên xwe derînin gund. Ji aliyê ve, emê dê û bavê te bibînin û hinek zêt ji me re divê. Ji aliyê din ve jî, emê zarên xwe ji vê zindanê bi derînin. Wan, hingî dipirsin, bavê me kengî me derîne seyranê, ez kurmî kirime. Di dema ku, pîreka wî gotinên xwe direşandin, wî dest avêtibû qutiya titûn û hûrik- hûrik cixara xwe dipêça.

- Tu zanî ku ez nikarim kemyonê bilivînim, nemaze di rojên î nê de. Çavên polîsên leşkerî, li ser her tirimbêleke leşkerî, vekirîne. Piştî ku wî cixare pêxist, pîreka wî gotê:

- Tu xwe ditirsî nê. Evqas hevalên te hene. Rojên î nê, giş bi tirimbêlên, hukumetê zarên xwe dertînin. Ti tişt çê nebûye, bes li ya me dipirsin.!

-Her kes li xwe digirî. Her roj evqas t ên girtin. Bes ew di ber xwe ve naçin. Ka çaydên bide min ev bû deh car dibêjim te ku ev ne tirimbêla bavê me ye, dema em bixwezin, emê lê siwar bin. Gava jina wî dît rê li pêş neman, deng li zarên xwe kir û gote wan: “ Hûn û bavê xwe bi hev bidin fêmkirin. Min ji orta xwe derînin”. Her pênc zarên wî li dorê dicivin, ji destê xwe dikeve û her pênc li ser seriyê wî dibin kom.

Erê... duh soz da bû zarên xwe, lê di bin zora hêviya di çavên wan de. Heya ber destê vê sibehê, wî nikaribû çavan bide hev. Ka di rê va rast ewên kum sor bê, yan tirimbêl pêre bişke, di deverekê werbe. Eger tişteki wilo bibe, divê venegere ser karê xwe. Xweş dizane ku wê hingê, divê ne bes jiyana xwe bide ser, lê ya zarên xwe jî.

Di ber-banga sibehê de, di xew ve diçe; xewek giran û reş. Bi tena xwe di beyabûneke tazî û ziwa de dimeşe. xwêdaneke bê dilovan bi ser laş ve girtî. Carekê çavan bi asîmên ve hildide. Riwekî tisî ye, ne heyv, ne jî ro û stêr, Heya bi demekê di cih de ziwa dibe. Di wê kêlîkê de, dengê ji hundirê wî ve tê ku, eve yek li pêş wî ye. Bi bazdana ku ew bazdide dêw-segek dide dû û gepeke goşt ji pêtika wî diterişîne. Ji nav nivînan tê avêtin; dinhêre ku Meyro xwe xistî ber. Wê dixwest, ku berî zarok şiyar bibin, wê êvara îne rij derbas nekin. Lê nizanî bû ku pênc tiliyên wê, li ser qalçeya mêr, dê bibin diranên segê.

- Tu çima ji cih veciniqî. gote mêrê xwe.

- Xewnek bû.

- Av germe rabe seriyê xwe bişo!. Bi fedî gote mêrê xwe, te digot belkî, di şeva xweye pêşî de ye.

- Dengê xwe hil nede. Bi gotinê re xwe qulabt ser sîngê wê. Hîn dîkan bangil ne dabû. zarên wan şiyar dibin û dibînin ku bavê wan şaşikeke sor, li seriyê xwe alandî, di bin de xûyanî dike por hîn şile; Berî ku ro ji piş dîwarê cîranan derkeve, ew ji mal dertên. Herdu zarên biçûk digel diya wan dixîne cem xwe. Her siyên mezin jî dikevin tirêla kemyonê.

Bi rê ve, çend caran bi ser jina xwe de kir qir---, nemaze gava wê gotê: “ka, berî em diçin gund, em derkevin ber ava ziravkê û kevirê îne. Di rojava de emê derkevin gund, çendekî li cem kal- pîran rûnin û xatir bixwazin, bi şev bighên mal”. Berî ku jina wî vê yekê bêje, ew jî wilo diramî, lê li behaneyekê digeriya ku, kela xwe di seriyê wê de birjîne. Mîna ewê rabûye û jinik; Bi hiceta ku wê di dema hevîr distira de kûna xwe dihejand, kotek kirî.

-Ev çi bihn e?. Li çavê herdu zarên xwe dinêre û ji Meyro di pirse. Lê, bêyî ku ew bersîva wî bide, kulemistekê di piştta keça sê salî de diteqîne.

-Tu yê bibê laş xwarine, derd pê ketê. Meyro bi biskên wê digre û serî vediçerpîne.

-Ne sûcê wê ye. Eger te ew derxistiba derve, wilo ne dikir. Tifi... bihna zikê mirovan ji kortên avrêjan genîtir e. Bi gotinê re belora di nik de dide xwar.

Di çate-reya ava ziravkê de kemyonê hêdî dike û dikeve ser reya wê. Piştî kîlo metrekî û birîna reya hesinî ya ku dihêle rojê carekê tirên ji Helebê bighe gundên Meydanan, ew dikevin bin siha darên Silfato û Çinaran. Zaroyan, hîn di tirêla kemyonê de, cilên xwe avêtibûn. Lê E. Remo li wan dike qîr, û wan vedigerîne.

-Vê sibehê sare, Xwe hinekî bigrin. Eger rok hate nîvro, hûnê xwe têxînin. Li bergera wan venegerad. Lê berî ku nîvro bibe, hêşt ew xwe têxînin nav û bi zorê ew derxistin ku bên çend parî nan bixwin. Belkî di rojêke din de ba, dê mîna kuliyan êrîştî xwarinê bikirana, nemaze gava bihna goşt bihata wan.

Li ser xwarinê, çend caran E. Remo, li zarên xwe dike qêrîn; ji wan dixwaze ku xwarinê bê deng bixwin. Cih kêncaxwe li wî jî kiribû. Du-sê parî xistin dêv û bi şûn ve kişiya. Tê bîra wî ku, çiqasî xwe xistî ava kanîyê. Kare kevirên di zikê gêlî de, yeko- yeko, bêjmêre. hêlînên ku li ser darên li dora kaniyê wî lezber kiribûn. Her rojê carekê divyabû bihata û li wan binêriya; (çi sal zû dibezin, tê bibê duh bû). Meyro serî ber ve wî hildide; dixwezwe wê hêstra ku bê hemdî wî hatibû xwar veşêre.

Ro didarivî ser milên çiyar. Siya daran qalin dibû. Gêreyên ku dûr çûne vedigerîn; dikin ku, barên xwe daxînin hêlînên xwe, û li hêviya ku, şeveke sar û reş biborîn, diman.

E. Remo deng li zarên xwe dike. Ji wan dixwaze ku, ferefolkên xwe komî ser hev bikin û têxînin tirêla kemyonê. Ew jî di dora wê re digere. Carekê dest li tekerê wê dide ku bayê wê kême yan na û cara din li motora wê dinhêre

ka av, mazot li cihê xwene. Li dawiyê siwar dibe û bi navê xweda merşa wê lê dide; humînî bi kemyonê dikeve û hêdî- hêdî ji nav daran der dixîne; di keve ser rêya axî.

Ew nêzîkî reya hesinî dibin. Berî bi çend mitran hêza motorê kêr dike. Heya gava ku tekerên pêşiyê dighên ber rêya tirênê, bi zorê der dikevin ser. Pêşiya wê hiltê û dadikeve. Di cara didwan de dema ku di-xwaze teka din ji rê bi bire, berî ku careke din bi banî keve, kemyon vedimre û bi şûn de, ji ser hêsin datê. Herdu tekerên pêşîn dikevin zikê cotê rêya hesinî.

E. Remo pêlî dibiryêc dike, fîtêsa wê vala dike, careke din lingê xwe datîne ser pêlgeha mazotê û merşê digherîne. Lê bê sûde. Çend caran vedigerîne, lê deng jê nayê. Dadikeve û pêşiya motorê hildide. Li betariyê dinhêre, ti tişt jê venebûye.

Careke din vedigere û dikeve kebîna kemyonê. Dîsa çend caran merşê lêdixîne, lê bê sûde. Gavê ev yeka bi wî re dirêj dike, hêdî- hêdî zarên wî ji tirêlê dadikevin. Ji bilî Meyro û keça sê salî, kes di kebîna wê de namîne. Wî jî xwe xistî binê wê, dinhêre ka belkî karibe sedema vê yekê nasbike. Zarok di dorê re didin dû hev, dihêlin bihna wî bêtir teng bibe.

Ew hîn di bin kemyonê da bû, dengê reş dibhîse; dengê borîna tirênê dikeve guhên wî. Bi lez dertê, lê ti tiştî nabîne. Wî ne dizanî, gelo ev yeka ji sîberên tirsê pêre çê bûbû yan bi rastî dengê wê bihîstibû. Lê dema carek, din deng tê, nema kare ji xwe veşêre. “Erê hîn dûre, lê di navbera şeş- heft kêliyan de dê bighe ser û ji çend mitran pêve ji ajovanê tirênê re, gava ji pişt kendêl derkeve, namîne. Dê wî di pêşiya xwe de bibîne. Wê hingê wê keys pêre nemîne ku karibe tirênê bisekinîne. Ev ramanên çûne, bi lez di mejiyê wî werdibin. Xwe davêje kebîna kemyonê. Li pîreka xwe dike qêrîn ku ew û Sînemê dakevin. Bi destekî derî jê re vedike û têve dide, bi destê din jî merşê digerîne, Lê bêdengiyê goristanî, xwe bi ser wî de vedirşîne.

Di kêlîka ku pozê tirênê, mîna dêwekî, ji pişt kendêl der dikeve, pêre-pêre borîniyeke (qêrînek) reş jê dikişe. Bi derketina wê re û bi dîtina ajovên re wî, bê hemdî xwe, destek avêtibû ser zemora wê û gewriya wê guvaşt. Destê din avêtibû ser firênan. Lê dema hest bû û dît ku eger firênan bernede wê tirênê di biniyê kendêl hilşîne, dest berdide. Lê ewê ku xistiyê gewriya wê, dixwaze dengê xwedayan jî vemrîne ku tenê dengê wê bi asmên ve biçe, bernade.

Xwe bavêje. E. Remo nihêrî ku, zarên wî bê şiv û liv mane. Reng li ser wan nemayî. Li şerê di navbera wî û wî dêwî, ku bi ser de tê, dinêrin. Şikestineke kûr di çavên wan de ye. Ev cara pêşîn bû dinasîn ku bavê wan jî ditirse. Gava hest dibe ku ji hundirê kemyonê tê rakaşkirin, nuh çav li Meyro dikevin. Bi hêz destê xwe dide sîngê wê. Wê têve dide.

- Tu zarên xwe bi dûrxîne. Eger derkevim, divê jiyana wan jî bidim ser. Wî gotinên xwe yên dawî bi nîv- dengî gotin. Di wê hîngê de, Meyro bi çend mitran tê avêtin. Wê ne dizanî bi bayê tirênê hate çengkirin, an têvedana mêr bû, an jî ji buhabûna cên bû.

Reqînî bi seriyê wê dikeve, dengê herfandina çiyakî dikeve guhên wê û kemyon, mîna goka zarokan, di pêşiya tirênê de tol dibe. Reşiyêke bêsinor dikeve ser aso.

Di kêlîka ku tirên dighe wî, çavên E. Remo û yên ajovanê wê dikevin hev. Riwê hevlekî ji zarokatiyê têde dibîne. Nişkabûnekê, di riwê wî de jî, dibîne. Lê ew nikare vê yekê biçespîne. Ev reya tîne bîra wî ku çiqas car ew bi hev re hatibûn eynî vê derê, da ku tirênê bibînin û destên xwe ji ajovanê wê re bi hejînin.

Bê hest, destekî ji wî kesî re hildide û di navbera xewn û rastiye de, dibîne ku li alîyê din jî destek tê hejandin.

Pencere

Bihna bencê, ji zû de, ji ser çûye. Êşeke giran xwe berdayî ser kezebê. Çend caran, dest avêt ser zengilê ku, di nik textê wî de bû, lê dengê wê bê sûde bû; ti kes bi xwe re derbaz oda ku, ew xistinîyê nekir. Gava hêvî birî, çav ji derî kişandin û berve textê hevalê xwe yê odê şandin. Lê ew jî winda bûbû. Ji bilî wî, û textê vala, û wê pencerê, ti tiştê din, ku bala yekî bikişîne, nedît.

Ev bû demek ketiye nexweşxanê, di roja ew xistinê de kesekî niv-mirov rûzer, ku li ser textê din dirêjkirîbû, bala wî kişand û nuha ew jî windabûye.

Careke din dest avêt zêngil, hinekê bihna xwe çikand, dengê piste - Pistekê, ji pişt derî ve tê. Lê careke din, bi dûr dikevin. Kezeb tê badan, diqîre û bê hiş dikeve.

Dema ji bêhişiyê şiyar bû, nizanî çiqas gav di ser re çûye. Lê ji valahiya zik têngîşt ku demeke dirêj di wê rewşê de mabû. Gavê dîsan xwest li zêngil bigere, destê xwe nedît. Bi hêz giriya. Ev cara didiwa ye, ku di jiyana xwe de digirî. Cara pêşin, wî bi xwe kir; dema bi çoyê şivantiyê, keça xwe ya çarde salî kuşt. Piştî, ku mêjiyê wê bi lêdana dawî re, li ser çar dîwarên odê, û heya ban jî, belavkir, di nivê odê de, li nik cendekê wê, rûnişt, qutiya tûtin ji berîya xwe derxist û piştî ku sê nefesên kûr jê kişandin, bi hêz û şewat giriya û xwest mîna her carê ku pez danî mal ramûsana dawiyê, ji rûdêmê Mîdiya bistîne. Nihirî ku, qoqê wê hatiye pelixandin.

Piştî demekê, wî gote xwe “çima ez destê xwe yê çepê naşînim ser zêngil”. Wê hîngê naskir ku, du destên mirovan hene, lê berî ku ew lê bide dît derî li pêş du kesan vebû, yek li ser selecekê dirêjkirî û kesê din wî têve dide. Piştî ku, ew li ser textê hevalê wî yê berê, bi cih bû Kendal Dêrsimî hinekî - bi alîkirina destê mayî- xwe hilda, li riwê hevalê nuh nihirî. “Rengê mirinê, hîn jê dûr e”. Gote wî kesî ku, ew anîbû. Berî ew derkeve careke din deng lê kir:

- “Ez dêşim.” Xwast bala wî kesî bikişîne, ser destê jêkirî, lê bersivek di rengê sarbûna çavên wî de hatê: “Em tev dêşin. li hêviya barkirinê be” û berî ku, Kendal biqêre “ka ezê bi kuva barkim”, mîna ku, ew ramanên wî bixûne gotê.

- Mîna ewên ku berî te, di odê de bûn û jê barkirine, rojekê tu yê jî barkî.” û derî li dû xwe girt.

- “Min çima derew li xwe kir, çima min got ev sê rojên min ez di virde me û çima min ne got ez nuha, li ser textê hevalê xwe yê barkirî, dirêjkirîme”. Zincîrên bûyeran, li dû hev kişyan, piştî sê rojan şiyar bûbû xwe tev yekî din di odê de dît. Textê wî kesî, di nik pencerê de bû û yê wî jî di quncekî odê de danîbûn. Piştî nasbûneke fereh, ji hemû aliyan ve, heya sedemên hatina wî, vê derê û hîne jî kûrtir ku, çi bi her yekî re, ji roja bûna wî, û heya roja îro, derbas bûye. Piştî ku ti tişt nema, li ser baxifin, rojekê K. Dêrsimî pêşniyarek kir.

- “Çima tu li ser bûyer û tiştên ku, li dervayî pencerê çê dibin, na peyivî; hema çi çê dibe, tu karî bêjî”. Di wê hîngê de, Kendêl tirseke kûr. Di çavên wî de dît, lê heya bi kêliyê dirêjkir, û piştî, ronahiyek ji çavên wî kesî barî û ji demên ku, ew şiyar dibûn û heya ku xewê li serên wan dixist, wî kesî çi li derva dibû digihand K. Dêrsimî. Dema li derva nihirî, hevalê çûyî, bi hemû çîrokên xwe ve, tîr ber çavan. Ew bi dengê bilind dikene dihêlê hevalê nuh, sê rojan nemîne, çavan ji bin bencê rakê û bi çavekî, ku tirs têde beloq, li wî binhêre.

- “Kêmasiyên min bibore”. Kendal ramiya ku berî nuha ev gotin kirî, an jî bihîstî.

- “Ne xeme. Bes çima tu dikenî? Rewşa me ya girî ye û tu tiştê din tune ye bibe sedema yek bikene ji bilî yekî” ... Lê ne got (dîn).



- Ev bû çend rojin ez bi tena xwe mame û bi hatina te şahdibim ka em wî kenî ji bîr bikin, û em hevdu nasbikin belkî karibin xwe û vê derê ji bîrbikin. K. Dêrsimî bi lezbûn xwe bi wî kesî da nasîn.

- “Te negot çima tu ketî vê rewşê”. Pirsra wî, careke din, çoyê şivantiyê û mejiyê ku, pê hatibû pelixandin, tîne ber çavan.

- “Çirok dirêj e .

- “Te tokê şeytên bi stûyê xwe xist”. Xwestineke bêdawî di çavên wî de dît ku çîroka wî bibihîse.

- “Eger wilo be bibihîse”. Piştî demek bê deng diçe, got: “giş ji wê rojê de dest pêkir; ji roja ku min got divê em barkin bajêr, lê heya hatina wî, em bi renekî surûştî dijiyan”. Mîna ku, nuha Kendal Dêrsimî deng li keça xwe bike ku ji ser pileyan bê û firavîne jê re deynê. Mîdiya, bi kenê xwe yê sipî, tê ber çavên wî. Ew derdikeve ku binihire ka çima ew lê venagerîne, çavên wî bi xortê ku nuh bûye cîranê wan ket, dinase ku, rojin kesk di jiyana keça wî de vedibin.

Dema Mîdiya dît ku, siya bavê kete ser, bi tirs şûnve kişiya. Berî ku ew di derî de winda bibe, Kendal cara pêşî dibîne ku qalçeyên keça wî dimilmilin. Gava wê xwest, xarinê deyne ber wî çareke din bi dîtina sînga wê re, keça wî nişkabûnekê pêre çêdike “kengî sînga wê çêbû” û bihna xwîne dikeve bêvlên wî.

Werimandina zikê Mîdiya nema tê veşartin nema kes baweriyên xwe, bi gotinên dê tînin ku, keça wan qelew dibe. Ti tişt nemaye ku, kanî derbibe û av bigihe bin K. Dêrsimî. Di rojêke bê sibeh de wî Mîdiya xist odê, çovê, ku ji kal - bava de, jê re mabû, ji piş istêr derxist, bi derba sisiyan re, mejiyê wê di çar kenarên odê de belav dibe. Heya bi demeke dirêj piştî ku çîroka xwe got, Kendal bê deng dimîne û dema wî kesî xwest baxife dît Kendal dest hilanî û jê xwest ku pirsên xwe bihêle demeke din û herdu, bi çavine beloq li ser têxt dirêjkirî man.

Roj diçin, pel diweşin û dar tazî dimînin. Ti tiştê veşartî di jiyana K. Dêrsimî de namîne. Diwan rojên bihurî de, hemû bûyer, êş û serpêhatiyên xwe ji wî re gotibûn

- “Te hemû tiştên li ba min bihîstin; nuha rola te ye, ka çî li ba te he ye.” Lê dema wî kesî xwest jiyana xwe ji Kendêl re biweşîne, dît ku zimanê xwe windakirî û bi devekî vala kenî. Ev windabûna zimên, hinekê bala wan bir lê piştî demekê ew jî bû tişteki rojane û nema biyaniyekê; nuhbûnekê dide çaxa wan. Bi hev re li tişteki nuh digerin ku rojên xwe pê derbas bikin û mîna ku Kendal gihîştibûyê, ewê nuh jî digihe wê ramanê, û dema wî got “ka bêje çî li derveyê pencerê çê dibe”. K. Dêrsimî bi dengê bilind kenî û serî jê re hejand.

- “Tu dixwazî bizanibî çî li derveyê pencerê çê dibe?.” Bi erêkirin, wî kesî serî hejand. “Ezê ji kuva dest pê bikim... Bibihîse: Berî giş ezê duruşmê ku, ji derve re dibihînim bigihînim te û pişt re, livên tê de çêdibin. Tiştê herî pêşîn rêyeke zo dibihînim, di nav bera wan de dar û kulîlk çandine, lê ji kuva tê, û bi kuva diçe ez nabihînim. Li aliyê din ê rê, gulistanek e, di nîvê wê de qesrek avakirine rengê wê sipî ye, ji du qata hatî rakirin di aliyê me de, û di qatê jêrîn de, heft amûd rakirine, banê wê bi qermîdên sor e. Pencerên wê, bi perdên xwe yê şîn, hindir diveşêrin, şivîle û rêçik ji pêşiya wê de, mîna rêçikên diza, bi nav gulistanê de belavin.

- “He... hee.. e..” Piştî çend caran ji he- heya wî kesî. Kendêl dengê xwe birî û lê nihirî ka ew çî dixwaze. Di livên destên wî re naskir ku wesfa rê û qesrê, jê re ne piwîste. Dixwaze li ser tiştên jîndar bibihîse.

- “Bibihîse, di her çendakî de zincîra utombêlan carekê diqete lê a nuha, careke din, ew li dû hev dikşin. Eva dibore yeke Marsîdis e, ajovan ji min ve nayê xûyan lê di aliyê me de, keçikek hîne nuh digihe rûniştibû; dolemeya wê bi bostekê di jorî kabokan re bû; gewdekî berfî li ser bû. Eva nuh çû Bîço ye; yeka bi pença reş û manto tê de rûniştî bû. Eva pişt, min

marka wê nasnekir çend Erebên bi kirasên reş, tê de rûniştibûn.” Dema ku, Kendal careke din dengê wî dibihîse, nasdike ku, ew ji wesfa utombêlan jî bêhinteng bûye û tiştêkî nuh dixwaze.

Lê berî ku ew careke din dest bi salixdana jiyana dreveyî pencerê bike, piste-pista hinekan li ber derî kir û gava ew bê deng man, herdu girtiyên odê li hevdu nihirîn; pirsra “kîne ev û çi ji me dixwazin.” Di çavên wan de lûs bûn. Dema Kendêl dît ew bi dûr dikevin, çend caran dest avête zêngil, lê ew jî windakiriye.

“Tu dixwazî, ez li ser kesên dervayî pencerê baxifim” Nihirî ku kenekî sipî li ser rûdêmê hevalê odê belavbû. “Ne xem e, ez benî, binêre.. Ji wê ve, sê xortan daye dû du keçikan; ew li wan venagerînin; xort gihîştin wan, xistin nav xwe. Yek ji wan sekinî û bi dîşlika xortekî girt, û ew veçepirand. Ên din bi hevalê xwe dikenin. Keça din hinekî bi dûr ket. Bes wer binihêr çi dibe; careke din xwe bê namûs dikan, dixwaze keçikê hembêz bike. Bes, dilê te bixum, te çi xweşkir bi wê tifûkirina, di riwê wî de. Çi, mîna segan, dûv xistin nav lingên xwe”. Kendal, piştî van salixan, heya demekê bê deng dimîne. Lê careke din ew li hevalê xwe divegere û diqîre: “wer binhêre li vî teresî, ew ji bavên wan jî mezintire- ji ber rihên xwe yên sipî ve şermbik -çawa bê fedî utombîl daye nik wan de û bi wan re daxife. Hey kurê segan, tu çi ji wan dixwazî, na...na!!” Dengê K. Dêrsimî tê birîn

Hevalê wî hinekê sekinî ku, careke din ew dest bi axaftinê bike, da bizanibê çima dibêje (na). Lê bê dengiya wî dirêj dike û, berî ku, ew zanibe ewê çi bike, dît derî li pêş du kesên, bi dîşlikên sipî vebû. Heryek ber ve textekî tê. K. Dêrsimî ber bi derî têvedidin, wî jî ber ve pencerê dibin. Xwast bi lez Kendal derînin; dixwaze dawiya çîroka ku, li derve dibe nasbike. Wî xwe pêşve têveda “Pencere nêzîk dibe çend gavên din, wê jiyana li pêş min ve be” û gava ew gihîşte ber pencerê, û li derve nihirî bi

devekî bê ziman kenî; kenekî zer, bi rengê beyabûna ku, li derveyê pencerê, dibihîne.

Di nav destên yê mezin de

Bêyî ku herdu dergevan wî bigrin, û jê bipirsin “Tu ki yî”, jê re derî vedikin û dibêjine wî derbazbe, yê Mezin li hêviya te ye. Civîn nuh dest pêbû”. Gava derî li dû tê girtin xwe di saloneke ji ên padişehên ku, di hin pirtûkên dîrokî de li ser wan xwendibû dibîne. Dirêjî û ferehiya salonê li dor ( 300 m2)e. Di sîngê salonê de rûniştoker - bi ava zêr hatî şûştin - danîne. Lê bêyî ku, kesî rûniştî li ser bibîne, ji wê rûniştokê û heya berî sekinîna wî bi çend mitran du rêzên rûniştokeran dirêj kirîne. Kesên ku li ser wan rûniştîne, piraniya wan jê re biyan in. Lê hin nasên xwe jî di nav wan de dibîne û yek silavan li wan dike. Ji K. Metê dikanciyê di ber mala wî de - û dibîne hin şagirt wî jî rûniştîne - heya dighe cem rêvebirê dibistana ku lê mamosteyiyê dike. Lê ên ne nas jî, carina wêneyên wan, çî li ser cildê pirtûkan, an jî di rojnameyan de dîtine. Berî ku ew karibe xerîta hundir xaşik bikişîne, dengê zer ji ser rûniştoka di sîng de herikî; di nivê salonê de kombû “di qefesê keve”. Bi gotinê re çavên (E. Toma) li komeke bilind û fereh ji “gû” - di nivê salonê de veniştî - dikevin. Demê ku, ber bi kesên rûniştî ve dinêre, her kes radibe ser xwe ku, ew jî li ser komeke gû rûniştî ye.

Careke din zikê xwe guvaşt; tiliyên wî, mîna pênc xenceran hunava wî diçirînin. Hundirê wî dikele; pêl li dû pêlê radibe. Dil hatî û di kêndira gewriyê de bûye “çiqîna maran”. Dike ku di dêv re derkeve. Berve kebînê dibeze û di deriyê wê de dinya li ber çavan reş dibe; mij û dûman ketî erdê. Laşê wî ditevize; xwêdanê serjêkirî wî dipêçe, û mîna dareke kok kurmî tê xwar. bi terqîniya ku ji seriyê (E. Toma) tê - dema ku li kenara kevirê derecê dikeve - çend kêzik ji xewa dana radibin, û bi meşîneke leylanî ber ve wî tên. Bihna vereşîya mirovekî, wan dikişîne.

- Tu çi dibêjî, ev mirî? Bi pirsaxwe re ket nav gola vereşîya wî.
- Wê rojekê bikene. Kêzika din lê vergerand û dema baskên xwe li hev xistin çend hêsir ji nav weşîyan.
- Tu çima bi mirinê dikenî? Kêzika yekem pirsî.
- Me hîne karê xwe yê rojane bi... û kaniya hêsirên, ku di bin baskên wê kêzikê de derbûbû, ziwa dibe.
- Ka wer arî min bike, em wî ji nav gola vereşîya wî derînin. Kêzika yekem got.
- Kesek nikare arîyên din bike, tu xwe dibînî.
- Ez te jî dibînim.
- Bes ez tu me, ez ne ez im, û eger bawernakî ka em ji vî termî bipirsîn.
- Min bihêlin.. berdin.. direvin/ vim . çima natebitim.. hi girêdin.. kê baskên min dizîne. Bi vekirina devê (E. Toma) re, û domandina vereşîya wî re herdu kêzik peyvên xwe ji nav ên wî didizin, û li gotinên wî dimeyînin. Herin... Giş bibezin.. lê rojekê ezê we bigirim; binasim ka hûn çi kesin. Her ku ew dixwaze bibeze, ji pêş segê ku dide dû bazde, ewqas lingên wî giran dibin, û hertim di cihê xwe de radibe - datê, lê ew gava, ku di navbêna wî û segê de heye, nayê şikandin. çi tiştên li dora wî û segê belavin ber bi pêşve diherikin; mirov... çivîk ... dar, mal, û heya reya dibin lingên wî û segê de jî pêşve diherike. Lêdana çakûçan di seriyê wî de bilind dibe, û bi qelaştina serî re, ku mîna cebeşekî dibe du perçe, ji nav nivîna hildibe.

Heya bi çend lêdanan ( E. Toma) nizanî ew lêdan ên çakûçên xewna wî ne, an lêdana kesekî li deriyê wî ye. Di golên xwêdanê de hatî şuştin. Di bin balîva xwe de du kêzik mirî dîtin - dema dest avêt wî cihê û xwest kilîtê derîne - . Lêdana derî her diçe germ dibe. Vedigere dibe destekî dûmanî, li qirika wî dalê û ber bi derî ve dikşîne. Ji piş derî ve bang li kesê aliyê din dike, lê bê ku ew kesê li derî dide deng bi xwe xîne. Destek di derî de şîn

dibe û nameyek di nav tiliyan de ye. Gava (E. Toma) namê ji nav tiliyan distîne, ew dest di hundirê textê derî de winda dibe û li şûna xwe birîneke kevin, ku dev hatî girtin, dihêle.

(E. Toma) li ser çar lingan vedigere hundirê xênî, û gava dikeve asîtanê, çavên wî bi segekî, ku di nav nivîna wî de raketî, dikevin, nerm û bi dizî xwe di quncekî xênî de diçelmisîne. Lê seg çavan radike û berve wî dinêre.

- Kî bû ewê li derî dida . Seg jê dipirse.

- Tu çi ji min dixwazî? Çima ketî dû min? Dide dû min ... min bi..

- Pirsên te pir in, ka bixwîne çi di wê namê de hatî.

- Tu ji kuve zanî?.

- Mat nemîne, ez tu me. Eger tu çiqas ji min bazdî... Ê bêyî ku (E. Toma) karibe xwe li ber pêlên xwestekên çavên (seg) bigire, destan davêje beriya xwe û nama destê ku, di derî de şînbûbû dertîne. (seg) ji nav nivîna dertê û li hember wî rûdine. Li çavên hevdu dinhêrin, her yek xwe di çavên ê dî de dibîne.

- Ka bixwîne çi dixwazin. Lê gava (E. Toma) dixwaze bixwîne dinase ku, xwendin ji bîr kirî, bêyî ku zanibe ji kengî ve. (seg) destan bervê dirêj dike, wê namê jê distîne, û li ber roniyêke di reşiyê de hatî gevizandin dixwîne. "Ji zûde em li pey tene. Tu ku ve diçî - tê, çi dikî - tê bikî, em her tiştên te dizanin. Lê heya duh kar û livên te ne bive bûn. Belê hin karên te hebûn - yê mezin - jê ne razîbû, lê me çav li ser dadimrandin. Lê duh bi wî karê te - yê mezin - pir zirt bû, û te di civîna xwe de dixwaze."

Seyda

Ava mezin - 6453

Bi xwendina navê xwediyê namê, cih û dîroka nivîsîna wî re (seg) wî pelî ji nuh ve ber (E. Toma) dirêjdike.

- Te çi jê fêmkir, û ka ji min re bêje kîne ev, û çi ji min ... Ê bêyî ku, bihêle zincîra pirsên xwe bibe serî (seg) jê pirsî: - Te çima duh wilo kir ?

- Min çî kir.

- Te çîma gote şagirtên xwe “çê nabe... belê, nabe ku, pepûk di qefesan de bin. Her kes divê qefesa xwe bişkîne, û pepûkê jê berde”. Te duh ev gotin ne got?

- Belê. Bi stûxwarî (E. Toma) vegerand. Bes divê çivîk ne di qefesan de bin.

- Ma ew karê te ye! çîma qefes çêbûn, demê ku her qefesek çê dibe divê pepûkek di hundirê wê de şîn bibe.

- Ezman ji bo çî ye.

- Ew jî xefkeke ji pepûkên wek te re ye. Dê ka nuha ji bîr bike ku, duh hebû. Di navbera îro û pêr de çaleke reş e bê binî di mejiyê xwe de bikole, da ku, tu herî civîna - yê mezin - û ew te berat ke.

- Ezê çawa herim? Ne ava mezin nasdikim.. û ev dîroka (6453) ezê kengî û çiqasî herim heya ez bigihim wê ?

- Ew ne karê te ye. Nuha tuyê rabî biçî (mexferê), û ewê te bigihînin - yê mezin -, lê berî tu diçî, te çî dît, divê tu nebînî. Bi gotina dawî re (E. Toma) wî li pêş xwe nabîne, lê dengê wî bi hundir mêtî de diherike “Wilo be... divê tu di civîna - yê mezin - de jî wilo bî”. Wî çiqas li hawîrdora xwe meyzekir ku, zanibe (seg) xwe di kuderê de veşartî, û dengê wî ji ku diherike, lê çavên wî bi tiştî neketin.

Piştî ku (seg) wînda dibe, ew ber ve nivîna, ku di nivê hundir de mirî, tê. Radihêje seriyê nivînê; balîvê ji ser herdu kêzikên mirdarî hiltîne, lê çavên wî bi tişteki nakevin. di ber xwe de dikene, û gotinên (seg) tîna bîra wî. Balîv ji dest xwe davêje, û ji mal bi dertê. Bi rê ve rastî çend şagirtên xwe tî; her yekî rahijî qefeseke, bi pepûkên serjêkirî dagirtî. Gava çavên wan bi mamoste (E. Toma) dikevin, li qefesên di dest xwe de dinhêrin, û di riwê wî de diken.. n.. ni.. nin..

ÇALA REŞ

“Ez vê pirsê ji te dikim... Ji min re ya rast bêje, Ehora Mezda, kê meşîna rojê, stêran nîgar kir.?”

Perda reş li seranserî gerdûnê belave. Asîman bê heyv û bê stêr e. Dem bê ro, ronahî derbas dibe. çiyayê Sablan di bin tariya demê de dibore, çivîk û cinawerên xwe hembêz dike.. Hin golên avê di nav dar û çawîrên zer de belav in; (rengê herî bi tenê).

Bi şepilandina destan dighe koka darekê û li ser şiqinekî bi cih dibe. Kut-Kuta dil demeke dirêj didomîne. Bi hejandina darê û herikîna bayê hênik re, ava di şiqinê darê de, di piştta wê re, dengekî Kûr, kor ji kûraniya hinava çalê dikeve guhên wê. Gotin.. pirs.. Eyros serî hildide.. û cara yekmîn çav vedibin. Ronahiyekê li pêş xwe dibîne. Rok ji wê ve dertê; nêzîk dibe- Xort di bîst saliya xwe de ye. Ji rûdêmê wî ronahî dibare; bê cil û pêlave. di destê wî yê çepê de gurzek agir e û yê rastê bi baxa gula Homa tê sotin. Gava ew ghişt darê..Enahîta xwe ji ser şiqnê ku li ser rûniştî berda nik wî, ji xelatên bav re çû secdê, mîna wê, Eyros jî xwe berda erdê.. herdû xelatên Ehora-Mezda dan pêş û piştî çend livên pîrozî baxa gula Homa li hev par kirin; xwar-in. Bi dawiya xwerinê re, ronahiya Eyros jê weşiyabû û li asmên belav bû. Gurzê êgir bû “ Çivîkeke Beravêtî”; û di riwê asmên de windabû. Reşî qetiya. Hevdû dîtin; tîr.. xedenk.. şerm û fedî ji çavan diherikin. Cihên şermiyê vedişêrin û di qurzîka çavan re temaşiya hevdû dikan.

- Gava me hevdû wilo dît, min xwe veşart.. û piştî ku min hin pelên dara mezin li xwe pêçan, ez ji piş koka wê derdiketim. Lê çavê min bi “Eyros” ne ketin.. Ew windabû. Ev e bûyera min ya herî kevin, ya ku min heya nuha ji pêş te veşartî”. Piştî ku Enehîta rê ji Zara nekir der û piştî 20 saliya wî kuta dibe, çîroka zayîna wî jê re sayî dike.

-“A nuha tu dixwazî, ez bi vê hêsaniyê bawerkim ku ez ji dendika gula Homa bi zikê te ketim”. Zara bi kerb li dê-pîreka xwe vegerand û bi



gotinên xwe re Enehîta berve devê çalê têvedide; devê erdê ji hev dibe; Enehîta pêde diçe û di reşe kûraniya çalê de winda dibe. Kaniyeke avê, bîranînan derdibe û cobarek jê bi rêdikeve. Li dor kanîyê hin gul û nêrgiz belav dibin. Enehîta ji kûraniya kor de deng li Zara dike.

- “Eger rojekê te dît ku tu bi tena xwe mayî.. bê kes, hembêz.. dê-pîrek, vegere û xwe bavêje hembêza min”. Gotinên wê dibin marine reş, xwe di çala de vedişêrin. piştî ku Zara dê-pîreka xwe nependî dike, gerdûn vala dimîne.

- “Tirseke zer dikeve dilê min, û ez ji herêma ciyayê Sablan direvim dikevîm, ser reyekê heya dighêmbajarê we.. ev bajarê bê pîrek; bê mê.. Her tişt tê de nêre. Tu dikarî ji min re bêjî çima? û hema navê bajarê we çi ye?”. Zara van pirsan ji kale- mêmê yekmîn, ku rastî wî tê, dike.

- “Tu Zara yî. Ez nikarim tu tiştî ji te veşêrim. Lê ev pirs te dê min winda bike.. Bes ji te dixwazim ku tu bi riya min bigrî û bernedî, eger çi bi min bê”. Bi koka riyên kale-mêr digre û ew dest bi bersîvan dike:” Navê bajarê me Or bû, bajarekî avayî û xweş bû.” -her ku kale-mêr daxivî ew diheliya.. diçelmisî- “ lê mixabin rojekê yekî bi navê Memed hat bajêr; bi lavêj, sihir û nivîştan karî bi seriyê me tevan bilîsta û hêşt ku em her tiştên mê bikujin.. û wek tu dibînî em çi kesên di bajêr de mane mîna hev in; tev di temenekî de ne û bi şêweyeke ramanê ne”. Li dawiya axaftina kale-mêr ji bilî riyên wî di dest Zara de nemabû.. û gotinên wî tevî qîrîna Zara dibin: “ez dêpîreka xwe dixwazim.. kanî himbêza te û ..” dihêle riya wî bilerze.. û li ser zimanê kalemêr, gotinin ji riya diweşin “bi dû min de, ezê te bighînim pîreka te”. Gotinên wî dibin dûpişik.. û di çala de xwe vedişêrin.

- “Û piştî ku riya kale- mêmê kete pêşiya min, min da dû. Em demeke dirêj, ku bi tozê hatî şuştin, meşyan, ji bajêr derdikevin û em ketin ser reya pîrekê, ku ji aliyekî bajêr ber bi kûraniya demê, meşînê de diçe. Her ku meşîna me kûr bû, pêşve çû; reşî û toz zêde bû. Lê hertim dengê riya

kalemêr, ez germ dikirim ku bi dû wî dim. Li dawiyê nema pêşiya xwe dibînim. Bi gava paşîn re, bi he- heya wî dengî re; dengê kenê Memed re,. Ez di çaleke reş, bê sînor werdibim û hîne di vê çala bê sînor ji reşiyê, valabûnê li dê- pîreka xwe; Li Enehîta digirim...” û perda reş seranserî gerdûnê belave.

## WÊNE

Di roja pêşin de, çavên wî dagirtin; bêtrî kat û nîvekê, li hemberê dan rûniştin û jê re gotin: “ li wî binêre”. Ji sola reş ya ku benikê teka- çepê hinekî sist bûbû, heya bi xêza di nav porde ku xistî aliyê çepê, bi dehê caran li ber wan disekinî. “ Gereke ez jêre bêjim pîreka wî guh nadêyê. Çawa dihêle ew ji mal derkeve û benikê sola wî sist bûye. Divê serok hertim hajî xwe hebe. Erê bes ez wî bibînim... belê, divê her çendakî li sola xwe jî binêre. Serok serok e, ne kund û pepok e ku, yek wî bavêje binê selekê û ji ber çavan winda bike”.

- “Baş lê binêre”. Dengê li guhê wî vedipeke; li hevalên xwe dinêre, bihna axaftinê ji devê kesî nayê; ji zû de ziman winda kirine. Dema li wê dinêre, dibîne ku ji mêj ve lêv ziwa bûne.

- “Kê got”. Careke din li lêvê wî dinêre, bi zorê ew ji hevdu bi dûr ketine. Di kat û nîva di hemberî wî de, ti caran çavên xwe bi yên wî nexistin. Piştî sî salî, ji rûniştina di bin nigên wî de, ewê bîr bibe ku di vê dema dû- dirêj de, hîn çavên wî nedîtine; “ çibkim ji çavên wî”.

- “Keremke. Ev maseya te ye; tu yê her roj komek “îdbare” û qurnefîlekê li ser bibînî. A, ji berî diçim, ji kesî nexweze ku tu wî nasbikî, ewê li te venegerîne”. Şeş kesên din li ber masan rûniştibûn.

Ev bû sî sal di ser karê wî, di erşivê de derbas bûne. Lê hîne bûyerên wê roja pêşîn, di seriyê wî de, tezen e. Di gava pêşî de naskir ku ew derbasî gorên bêdengiyê bû; korîdorekî dû- dirêj; li her aliyekî rêza odeya zincîr girtine. “Bi dîtina kûrekî ev cih tête ronîkirin”. û bihna kefnikê firnkên wî

qermişandin. çend caran kir ku pirs a oda sekretariya, ji ewên ku mîna dûpişkan didan dû hev, bike. lê pirs bê guhdan dima û di dêv de vedimirî. Dema wî kir ku ji nuh ve pirs a bê guh vegeştine, odeya hemberî wî, kesekî nîv vemirtî velûdike û mij- dûman vedikşe.

-“Eger tiştê gerekî te bû, wê murika di ber te de biguvêşe. Ji bîr neke, kes ê bersîvên te ne de, we her yekî pişkokek heye”. Ev cara dudîwan bû ku ewê nîv- vemirtî jê re digot: “divê tu bi kesî re naxifî”. Rahîşt wênê û bi jorî seriyê wî daleqand. Divyabû ku bi ser seriyê her karmendî ve, wêneya serok bê daleqandin.

Pehn û dirêjbû, nîvê dîwarê li piş seriyê wî girtibû. Ji tîna nirînên wî her tim destmala, di ber qemçika H. Hebeş de şilbû. Nediwêrî çavan ji pelên di pêşiya xwe rake, nemaze gava ku dixwest çavan berde nav nigên wê keçika ku, li hemberî wî rûdinişt; ewa dikir ku xwe ji bîrakirî. Di wan kêlîkan de, gotinên wî mîna mişkên fetisî bi ser seriyê H. Hebeş de dibarîn.

- “Çima ez wî ji dîwêr nakim û navêjin kuncêkî odê”. Ew hîne bi ramanên xwe ne lîstibû, hatin ew birin û mehekê bi wî lîstin. Ji wê rojê de, careke din be ku ew bi ramanên wî re bilîze.

Çit; dengê qetîna hevdeyeke dezî, wî hest dike ku bar- kirina wî jî nêzîk dibe. Her şeşên bi wî re, di odê de hatibûn guhartin. Keçik ya dawiyê bû. Di wê rojê de sozkiribû ku ewê perda tirsê bi çirîne, deng û silavine sor, li ser masa di pêş wê de, di piyaleke camane de, deyne. Mixabim, çaxa wî hêz da xwe û ji piyan sekinî, dengê hirifîna dilekî kete guhên wî û baxçeyeke ji gangiliyên sor di odê de şînbû. Wêneyê serok, di eyne çax de, bi ser seriyê keçikê de hatibû xar.

Dil vemirt û xewn ji jiyana wî wînda dibin. Ji berî ku ew barbike, her ku vedigerî mal şevrojên xwe bi wê dixemilandin û hertim bûka roja pêşîn bû. Lê wêneyên serok xwenên wî şikandin, “çima di eyne roj de, ji berî

wê ba çênedibû?. Te çima gotin di devê de min rewisandin?”. Bi gotina dawiyê re, careke din dibe mêvanê kesên bê deng, li cem xwe direwisînin û bîranîneke nuh jêre vedikin.

Rojên wî diweşin, Pir guhertinin nuh bi xwe re anîbûn: Devekî bê diran, Porekî sipî, riwekî qermiçî û sîngêkî bê dil û hest.

- “Evê nuh bûye mêvan, çima ewqasî çavan, di min de, dişewitîne. Kê gote wî ku yê dawiyê ez im?! Ma, ez li ser sîngê diya wî rûniştîme... çima ne dirêj kirî”. Wî çavên xwe kutan ên nûhatî, hêşt ew berê xwe biguhêre. “Ji zûde me mêranî ji bîr kirî”. Di serketina şerê bi çavan de, xweşiyêke mezin dabûyê û kenekî vemirtî di riwê de dihêle.

Çit; “ Ev cara dudiwa ye. Ew dizanin kêjan deziyê bênin; dihêlin yek dilopên jiyana xwe bêjmêre. Di rojêke wek îro de, ez di korîdorekî dû-dirêj de dimeşîm û pirsê min a bê guh li ser lêvên min xwe ji bîrvedikir”. Ev çend ramanên jor, bi lez dan dû hev. “Iro sî sal çê dibe, lê hîne çend kat mane ku, ez pelê sî saliyê biweşînim”.

Di van katan de, xortekî nûgiha dikeve devê korîdorekî dû-dirêj; li her aliyekî rêza odeyan zincîr girtî; mirovne dûpişkî ji wan odeyan dikşin. Lê pirsê wî bê guh dimîne. Kesek, ji aliyê odeyekê ve tê velûkirin û dide pêşiya xortê nû-hatî. Bêtirî kat û nîvekê, li hember wêneya serok dane rûniştin, çavên wî dadigirin û... çit.....

Sing

- “Tu kûr bibî”. Bi terqîna kûz û belavbûna parên wî re, dê nifiran li keça xwe ya panzdeh salî dibarîne. çingînî bi zerika wê ket. Ev yeka jî nîşana dernexwîniyê ye. Di mekra vê yekê de keçik hatibû kuştin. “Zerka te neşkî lê çingiya”. Bavê jê re gotibû û kêr dabû stû. Dema Meyro kûz şikand û nifir ji dê bihîstin, ev çêroka dîrokî di mejiyê wê de meybû. Bi ber çavketina Xorşîd re, tevzînok ketin canê wê, bi lez rahişt perçeyên kûzê şikestî û bermaleka xwe avêt. Xwest berî ku çavên wan li hevdu rast bîn,

ji hundir baz de, da ku raz û soza wan bernavêje. Lê dengê dê ew vegerand.

- “Şûna xwe ziwa bike”. Keçik şêt ma, ka axa gewr dê bi çi ziwa bibe; bilî aramek tihî û riswa, çiyê karibe ziwa bike. Zembîla kayê gola avê vedişêre. “Erê ava bin kayê” tê veşartin, lê çiyê wê veşêre. Ji heriyê derdixe û dixê nav diriyê.

- “Li şûna tu kil dî te kûr kir. Here çayekê bi ser êgir de”. Dê ji Meyro re got. Zemîn fereh dibe.

Gundê Kela tevan bi hezkirina Xorşîd û Meyro dizanî. Heya li çend gundên dijî çêroka wan belav bûbû. Lê herdiwan perdeyeke sipî avêtibûn ser çêrokê û li hêviya bavê Meyro diman ku, seriyê hespê xwe nerm bike û gotina “Erê” ji devê wî bi bare. Lê her ku çêrok germ û bêtir belav dibû “Na” ya wî jî tûjtir dibû û bêtir berê hespê xwe dida qirêc.

Piştî ku Xorşîd ça vexwer, cixareyek nuh pêça, xiste nav lêvan û dûyê cixarê li şûna xwe hêşt. Berî ku ji Meyro derbas bibe gotina “soz” mîna kuzotekî êgir rûdêmê wê riswa dikin.

Di nîvê şeveke tazî de, dudu ji gundê Kela bi rê dikevin. Gav bi gav li piş xwe dinhêrin û her çendakî yê pêşîn guhên xwe bel dike û kûr guhdariyê li derdora xwe dikê. Dema dengê segan bi dûr dikeve, nuh bihna xwe ber didin.

“Ka tuyê bi ku ve biçê, kesekî rût kiyê li xwe bigre û dê çawa bê veşartin”. Piştî ku Xorşîd ji mêvantiya sênga Meyro ve digere nuh xwe di rewşeke gergerînok de dibîne. Di çirûskeke sipî de destbirayekî bavê wî tê bîrê, berê xwe dide bakur û dikeve ser reya ku, ber bi gundê Xelîl ve diçe. Mal mala gur e ne arde ne bulxure. Mixabim, erê ne ard e û ne bulxur e lê mal jî ne mala gur e. Şevêkê li cem destbirayê bavê xwe dimîne; tev xwediyê malê berê xwe didin mala gur û xwe davêje nigên wî. Piştî ku merasîmên

koletiyê bi dawî tîn, ji bin nig û gunên axayê gund vedigere û di nivê odê de xwe li ser çongan berdide erdê.

Heya bi demeke dirêj, di wî cihê de, Xorşîd tê tevizandin. Civata axê hêdî-hêdî belav dibin, Her yek du singan li dû xwe dixuşîne. Ji bilî axê, kesî nikarî lingên xwe ji bin xwe derxistana, rê ji wî re hebû ku nigên xwe, heyra bi nivê odê, ber bi devê xwedê ve û bi nav nigên jinên wan de jî, dirêj bike. Gava axa dixwaze ji odê derkeve û zanibe dê îro di hembêza kîjan jinê de raze, di çûna xwe ya nêv- xewî de, li Xorşîd rast tê.

- “Te çi dixwest?”. Berî Xorşîdê Elê çêroka xwe bîne ser zimên, careka din û bi ramûsaneke teze ji nigên axê “yên pîroz”, lêvên xwe bimbarek dike û çêroka hezar salan- bavan ji axê re di deziyekî şil re dike; teneyên wê yên kefinkî, yeko- yeko, li dû hev berdide.

Çend roj di ser çêrokê re diçin, ew belav dibe, bihna hevrevandina Xorşîd û Meyro li sêsed û şêst gundên Efrînê belav dibe û tê zanîn ku wan xwe avêtine piş Omerê Çîlik. Erê gur gur e, lê keftar hartir e. Neqşa Efrînê dibêje ku gundê Xelîl û Mamila nêzîkî hev in; cihwar in. Gurek li vir, keftarek li wire. Teka mêzînê dadigere. Ev yeka li zora Xelîl- axa tê, peyakî xwe ji O. Çîlik re bi rê dike. Piştî silavan ew peya Xorşîd û Meyro ji wî dixwaze.

- “Here bi bêje axayê xwe ku, Omer- axa jî dikuxe”. Peyayên keftêr, bê peyîk, li axayê xwe vedigerin. Kuleke û di sîng de tê veşartin, lê nayê ji bîrkin. Çend meh di ser çêrokê re diçin.

- “Ji gur pirsîn: çima stiwê te qalind e?. Got: Ez bi destên xwe dikim û bi devê xwe dixwem. Ev ji kevin de bû, di roja îro de hûnê bi destên xwe bikin û bi devê min bixwin”. Omer- axa got û berve Xorşîd nerî. “Ev bû çend mehên te ne tu rûniştî. De ka rabe tu û Meyro derkevin şiyê û vêrgê ji cotariyan bistînin”. Rûniştina wan bi xizmetkarî qediyabû. Ewê derkevin û gotin dê bigihe Xelîl- axa ku ew ji bin kurkê Omer derketine.

- “De hûn jî rabin bidin ser reya şiyê û herdiwan ji min re bînin; divê hûn destê Xorşîd di piş de girêdin û li dû hespên xwe, heya dighên cem min, bixuşînin”. Xelîl- axa vê fermanê dide û sê peyên xwe bi ser wan de dişîne. Bi gotinan nêzîk e. Qonaxa danekî bi rê de dimeşin. Segê mîr mîr e. Gundê şiyê kiribûn du par, nîviyê vêrgê ji Xelîl- axa re û yê mayî ji O. Çîlik re bû.

- “Xorşîd rabe, bê riswayî bide pêşiya me”. Rê li ber Xorşîd neman ku karibe pêde bireve, sê peyên axê bi mertîn di ser seriyê wî re sekinî bûn. Di nêzîkî gund de destên wî di piş de girêdidin.

- “Bi singê ber derî ve girêdin û jinika wî bînin vê derê”. Xelîl axa dibêje peyên xwe û derbasî periya odê dibe. Werîsê ku Xorşîd pê girêdabûn ji berdehê hêsp vedikin û di singê ku nîşanî wan kiribû girêdidin. Jina wî jî dibin oda axayê xwe.

- “Gotina te li ser seran axa”. Hersê peyên mirinê, piştî ku Meyro têvedan nîvê odê; nav nigên wî, di devê derî de li diyariya wî man ser nigan.

- “Ji min re Husîkê bînin”. Û mîna ku ji bilî wî, kes li odê tinebe, bayê reş ji ber xwe berda. Pisîkeke fetisî ji peyîka wî direve ser laşê Meyro û di nav memkên wê de kaniya gêrikan derdibe.

- “Ez benî, gotinên te li ser seran”. Bi çarlepan xwe dighîne nigên wî “yên pîroz” û maçeke mibarek ji wan dibe.

- “Husîk, here Xoce Elî bîne; bila vê pîrekê li te mehir bike”. Bi gotinên wî re malika gêrikan ji sîngê Meyro hildiweşe û cobareke hunguv ji sîngê Husîk diherike. Gotina wî merem e. Xoce Elî, tev kiras û şaşîka xwe, di xizmetê mîr û segên mîr de ye.

- “Emê kê bi bavê Meyro kin”. Xoce Elî pirsî û guhên wî dengê dîkê ku, li derve dihate fetisandin, zeft kirin û vê re jî nirîneke kizirî ji sîngê Meyro direvîne. Bêyî ku serî hilde, axê got: - “Xorşîd”.

Birûskê li mejiyê Meyro xist û dengê wê windakir. Şeva revîna wê tê ber dil û tê wer dibe. Zerika avê dihêle çavan hilde û bavbûna Xorşîd ji xwe re dibîne. Di şeveke basik- şikestî de, Xorşîd ji toximiya Meyro dadikeve û dibe bavê wê. Mehirkirina wê li Husîk pîroz dike û piyana şerbeta wan berdidin ser lêvên wî yê qeşagirtî. Sergêj dadixînin ber singê girêdanê û di gel segê nobedar de, şeva sipî dimijin. Çend caran xwest çêroka xwe ji wî re bibêje, lê seg ji hevaltîya wî direvî û guhên xwe dixistin bin nigên xwe. Di ber banga sibê de, berbanga ku mele kesên misilman ji hembêzên ziwa derdixîne, dest- nimêja xwe digre û Xorşîd reya sarincê dûz dike.

- “Xorşîd, kurê min, dê here ji bûk û zavê re avê germ bike, da ku nimêja sibehê li wan neçe. Kesê misilman divê nehêlibe çavên yekî pêkeve û hîne wî seriyê xwe neşuştî”. Berî ew ji cem bi rêkeve, Xelîl- axa carek din deng lê dike.

- “A... Xorşîd, divyabû te xwe li min bigirta ne li Omer. Ji bona yekî wek te em pev naçin. Bawer meke ku ew dê peyên xwe bi ser min de bi şîne. A... berî ji bîra dikim; piştî ku te av ji wan re germ kir, vegere ber sing û xwe girêde”.

## Şikefta Ketî

Berê xwe da bakur û ket ser rêşivîla ku ji gund dikşe. Çirayên gund bi her gavekê re kûrik dibin û gavên wî sist û giran dibin. Çend caran kir ku, ji nuh ve vegere û, ji civatêre, poşmaniya xwe xûya bike. Lê mêrxweziya wî nedihêşt, “bi gaveke li pêş, dudu li şûn” reya xwe girtî. Şeveke reşesipî û sar e, kuliyên berfê tîn xwar; berfeke reş û giran. Piştî her çend gavan kurkê xwe datîne û dadiweşîne. Ev yeka li ber çûn û ketina wî ya nav berfê



de ne tiştibû; mîna êzingekî rût dihate xwarê û heya bi çend gavan tol dibû.

“Çima wilo hov derketim û min gote wan ku, ezê herim”. Dengê kundekî ew ziwakir. Bere wî cihê ku deng jê der ketibû nihirî, bi dîtina wan re çend hêsir û diran hatin xwarê. Komeke mirov- hestî di pêşiya wî de sekinîne. Hinek ayetên Quranê, ku di çend rojên li cem mele Qedrî xwendibûn, yeko- yeko reşandin. Lê bê sûde derketin. “Çê nabe, dûvê sege. Wî çiqas digote me van ayetan lezber bikin: ên cinan direvînin, ên te ji çavên şîn diparêzin, ên... heya ên dihêlin ku, keçik bidine dû yekî min ji bîra kirine”. Dengê kund, careke din çavên wî ber bi wî cihê ve dikşînin. Di şûna koma mirov- hestiyên de segekî reş dibîne. Wî nedizanî ew nêzîk dibe yan seg berve wî tê. Vê yekê hêşt ew bibe bablîsok û ber bi bakur ve bikşe, lê seg bahozek li dû rakirî. Dîtina wê ronahiya dûr, dilekî nuh di sîngê Hemzeyê Zîrek de vejand. Mîna lehiyekê bi ser de çû lê bêyî ku, karibe ji devê segê reş derê. Bi dengê kundê ku, di jorî mala kelef re difirî, di devê derî wer dibe û “deziyên pilindir diqetîne”.

Sisê bûn û segê wan ê çarê bû, çar bûn û segê pêncê bû, şeş bûn û segê heftê bû. Bejn bost û rih çar bostî, bi nênûkên şûranî zikên qurbanên xwe diqelêşin û kezebên wan derdixînin.

Bi ketina şikeftê re wan, ji xewa çend hezar salan, şiyar dike. Bi dîtina wî re, ew xwe di qunckên şikeftê de vedişêrin. Gava H.Zîrek wilo dibîne, bi lez xencera di ber piştê xwe de dikşîne û di nîvê şikeftê de diçîne. Bi lêdana wê re devê kaniyê dipişkivîne û cobara xwînê diherike. Bi derbûna wê re masîne mirî derdikevin. Vê yekê tîrsa wî tûjkir û bi çar- lepan berve deriyê şekefta ketî direve.

Ji dema ku, ew ji civatê hilbû û ket ser reya şikefta ketî, bê dengiyek giran konê xwe li ser rûniştina wan verşandî. Navê şikefta ketî dendika toximiyê di hundirê mêran de ziwa dikir, Kesî di xwe de ne didît ku rojekê derbasî

nav tariya wê bibe. Dema dixwastin tenaziyên xwe bi yekî bikin, jê dixwastin ku here xencera xwe di nîvê şikeftê de bi çikîne. Di rûniştina îro de wan H. Zîrek dabû ber bihna xwe, lê kesî bawer nedikir, ku ewê rabe ser xwe û dev bide ser reya wê. Heya dema ku ew ji civatê derket jî, piraniya wan got: “ew nuha li ser reya male”.

Şikeft:

Tukes nizane ku, ji kengî ve bihna mirovan neketiye hundirê wê. Bi çarpênc kîlomitran, li bakurî gundê çeqela dikeve. Ji ber ku nîvê ban ê wê hilweşiyabû, nav lê kiribûn şikefta Ketî. Dareke tiwa nêr devê wê veşartî. Ji neçûna kesî bi ser de, bi stiriyan xwînê û diriyên hatiye winda kirin. Rêşivîleyeke tenê di nêzîkî wî re dadikeve ber sînore Turkeyê, lê kêman caran te rêwiyek li ser wê didît.

Çerokên li ser tînin :

Ji berî çend hezar salan ve, Padişehê vê derê keça xwe li xwe mehir kir û di çend rojên xwe yê paşin de, keçik ket hundirê vê şikeftê û barê xwe danî. Dema dît ku cinawirek jê ketî, xwest li şûna xwe bihêle û bireve, giriyê zar, ew bi şûnde veşerand. Memkên xwe xistin devê wî zarcinawerî, lê wî bi memikan tenê nekir, di her danekî de parek ji wê dikir û dixwar. Ji wê rojê de her rêwiyekî li dora şikeftê bibîne, wî dikişîne mala kelef.

Li hember vê çîrokê hinek derdiketin û digotin a rast ev e ku, ji zû de ev cih cihê seyran û kêfê bû. Ji devê vê şikeftê kaniyeke zelal derdibû, keç û lawên van derdorên li ser kom dibûn û cejin û newroz lê lidar dixistin. Di rojêke bê sîk û perde de, dêwê reş tê ser kaniyê û dilxwaziya keça melîkê bajêr dike. Lê hezkirina bavê wê jê re dihêle ku ew rojê keç-qurbanekê ji dêw re bi rêke. Ji wê rojê de ev cih dibe cihwarê dêwê reş.

Hineke din digotin na. Çêroka wan jî li ser Xelefo bû ku, ji berî demekê kesek li van gundan bi navê Xelefo hebû. Di rojêke de ew zû ji dizîya pezê

reş vedigere û şivanê xwe di hembêza jina xwe de dibîne, bêdeng her diwan bi hev ve girê dide û dibe şikeftê. Di her rojekê de zaroyekî xwe serjêdike, goştê wî dikelîne û ji herdiwan re dibe. Di roja heftan de zarê xwe yê dawiyê serjêdike û tev seriyê wî ji wan re dibe. Dema pîreka wî wilo dibîne har dibe; mêr û yarkê xwe dixwe.

Mele û feqehên gund jî çêrokeke xwe li ser vê şikeftê ristibûn. Digotin ev Çêrok giş derew in, navê şikeftê yê rast “şikefta Hera” ye. Xwedayê dilovan ji pêximberê xwe re got here wê şikeftê û li hêviya Cebra- II be û ji ber vê yekê nav li wê şikeftê bû “Hera”.

Di wê şevê de, civata lidar, van çêrokan vedigerîne zimên û her çendekî çavên xwe ber bi derî ve dişandin, lê pêjna H. Zîrek neket hundir. Tenê dengê gurekî dazirî li derve dikirin. Bi banga dîkan re, çendekan ji civatê xwe dane hev û derketin.

Lê... çi bibînin. Hewşa mala ku tê de rûniştine, di xwînê de hatiye gevizandin û cobara xwînê, ji şikefta ku dewar tê debû ber bi gedûkê ve diherike. Di nîvê şikeftê de jî, di nav laşên pêz de, xencera H. Zîrek hatiye çikandin.

Ji wê rojê de gurekî har û dev bi xwîn kete holê.

## Qeşmer

Di nav bera roj û şevê de, ew bû yek ji nîşanên wê deverê. Mîna her tiştên vî welatî ku, ji nişke ve serî hildidin, wî jî heyîna xwe standibû. Te digot belkî ew ji berî holê jî li virbû. Di çend rojên pêşîn de hin kesan xwestin wî nasbikin; dikirin ku êşa wan bi ser miriyên wan de bêtirî ya kesên bajarê “EFRIN” ê ye; ew her roj dadiketin ser gorên kal- bavan û çavên xwe yên bi şelmo, di rawestandina wî ya di nav goran de,

diçikandin. Tevî gişî jî wî nedihêşt ku kes nêzîkî wî bibe. Ger çiqas civakeke fireh jî nêzîkî wî biçûya, bê silav li wan dinêrî û eger ku te bixwesta silavekê li wî bike riwê wî yê sar meşa te ji xwe dûrdixist, dest li te sar vedigerîn û lîstika kurkê, ku li xwe pêçayî û di nav bera her çendekî de li goreke ziwa tê alandin, dikişand.

Di roja ku, ez gihîştim mal, ev bû çêroka pêşîn ku bala min kişand. Hîn di kêlîka ku ji min re salixdan, min xwest ez wî kesî nasbikim. Lê çûn û hatina mervên min û xêrxwestina vegeerîna min, hêştin ez hinekî vê dilxweziya xwe bi şûn bixînim. Lê “Parêzî bi Ereban nabe, çimkî ji kevin de wan em dizîne”. Belê yek caran min cîroka wî ji bîrdikir lê mêvanên min ew bi rihetî ne dihêştin; çêrok di devên xwe de kiribûn benîşt.

Û ji lîskên gerdûnê, di roja ku ew ne di bala minde bû, min ew naskir. Sibeyeke Tîrmehê bû, di riwê rokê de çilpikên xwêdanê dibirûsîn. Li ser dengê bavê xwe û gotina “mir” min çavên xwe misdidan. Piştî ku hinekî min hişê xwe birefikir, min çêrok naskir. Bi lez min çavên xwe şûştin, cil li xwe dûzkirin û der ketim mala cîranê ku dengê girî jê dihat.

- “Çawa çêbû”. Piştî min silav li civatê kir, min ji kesê ku di rex min de rûniştî bû pirsî.

- “Ti kes nizane”. Bi xwîn- sarî bersiv da.

- “Çawa kesî ne dît?!”. Min hinekî bi xeyd û deng bilindî, lê vegeand. Kela min bêtir ji bersiva wî ya kurt hatibû. Min hêşt kesên nêzîkî me, bi çavin beloq, li me bimeyzînin. Wî jî xwest vê yekê bin cil bike, lewre bi dostaniyeke bêdil, seriyê xwe xiste ber guhê min.

- “Wek min ji te re gotibû, tu kesî ew nedît. bavê lêwik, ji ber- benga sibehê de derketibû, dê jî çûbû mala apê xwe; malên wan nêzîkî hev in, du gav in. çûn û hatina wê pir dirêj nekir. Lê gava dikeve deriyê malê, dinêre ku zaro xwe li ser çemento dirêjkirî. Di bala wê de ku lîstikeke zarokî ye. Di ser wî re disekine, lê ew şiyar nabe, bi destên wî digre, lê di

cih de qîjînek jê tê, dihêle cîran lê bicivin. Hatina bijîşk jî bê sûdbû; kesî ti tişt jê fêm nekir. Ev e cêrok”. Wî hinekî bihna xwe biderxist, lê bihna min tengbû. “çawa kesî ti tişt jê fêm nekir”. Min xwest ez wî hîn bicivilînim, lê gotina mele ez ji rê vegerandim. Em tev rabûn ku bi zaro re derkevin mezela bajêr. Bi rêv e, di meşîna li pey termê zaro de, min hinekî xwe nêzîkî pîrekan kir. Kurte- pistek di navbera wan de hebû.

- “Na yadê, ji ku bi nê...”. Lê min pevok giş ne bihîst. Di wê kêlîkê de, mele xwendina destpêka pirtûka xweda xwestibû. Gotina pîrekê anî bîra min ku dema mele zaro dişuşt çavên min bi pariyêke nan, ku di devê zaro de bû, ket.

- “Eger ne ji pariyê nê, wê ji çibe?”. Pîrsa pîreka din, kela min careke din bilindkir. Zaroyekî çar salî, rojekê ne gotibû seriyê min têşe, çawa bê deng, bê ferman bimre?!

- “Nizanim. Bes wek min bihîstî, û xweda şahide, dibêjin ku (Dê) ew fetisandî”. Pîrek a lê guhdarî dikir kir ku bi qîrîn deng derîne, lê haje xwe hebû; di cih de dest danî ser devê xwe. Bihîstina salixa çûyî tû li min qijkir.

- “Çawa?!”. Pîrsa min û pîrekê bû yek, hêşt ku pîreka salix dida li çavên me herdiwan binêre, lê min kir ku ez ne li ba wan im. Ew jî şet man ku dengê din, ji bilî yê pîrekê, hebû û dema dîtin ku der dora wan kere careke din vegeîn çêrokê.

- “Dibêjin, û dîsa xweda di nav bera me û gotinê de be, ku gava ew derketibû mala apê da ku li zarê xwe yê din bipirse ku çima ew dereng mayî, evê ku çûye dilovaniya xweda xwestibû pîre here. Lê kir qêrîn ku li ber malê bimîne. Lê, ji ber ku qêrîna wê bê sûde bû, teka gorê ji lingên xwe kişand, kire qulp, xiste stûyê wî û ew bi pencerê ve girêda. Mala min bişewite hingî belengazî xwe kişand qulp li stû hat hev, hêşt lawik bifetise”. Her ku pîrek ber dawiya çêrokê diçû, min xwe nêzîkî wê dikir; min xwe nedît ku di nik wan de dimeşim û haya min ji mele û bilêvekirina

navê xweda, bi yek carî, tine bû. Têra ku mirov ji xweda bireve, navê wî anîbû ser zimên.

Di kuncêkî goristanê de sekinî bû. Te digot ew pareke jê ye. Belkî ya rastir ew be ku yek bêje goristan pareke ji wî ye. Riwekî sar, di geliyên rûdêmê wî de qeşa girtî; du rok di çvên wî de hatine vemirandin, qeşa wan dihêlin dilê mirov vemire. Li gor gotina gundiyên min wî nêzîkî li heştê salî kiriye, lê di bawerîya min de wî pêncî sal jî neqedandî, bes carna dîrok ji mentiqê xwe yê sirûştî der dikeve. Min xwest ez wî ji nêzîkî ve bibînim, min xwe ber bi deriyê goristanê ve kişand, lê ew winda bûbû, heya dema ku mele dest di ser riwê xwe re kişand û ji mervên ê mirî xwest “rêz bigrin ku xelk seriyê we sax bike”. ew bi ber çavên me neket.

Di kêlîka ku me fikir em ji goristanê derkevin, çavên min bi wî ketin. Ew di ber kêlîka tirba pûç de ketibû. Min nêzîkî li wî kir, çend caran ez kuxîm, lê min nikarî bala wî bikişanda. Bihna mirinê tehl e û dûr diçe. Ez di jorî wî re rawistîm, min dît ku lingê qeşmerekî nav zeviyan “feza’e” şikestî û gêrbûye ser tirba pûç û tihî. Lê dîtina zanaveke osmaniyan di nik qeşmer de, kesîtiyek dida wî. Bê ku fermana ti kesî bistînim, min ew xiste berîka xwe, kesî jî ne got çima û çî bû ewê te xistî berîkê xwe. Lê ti tiştî hêja jê ne hat standin. Ji bilî ku navê wî Gerebit e; di sala 1886 an de, li ser dengê giriyê xwe, ken û lîlandina yên dorê, cara pêşîn çavên xwe vedike, lê kesê nizanibe kengî cara dawiyê çav dane hev. Hemî agahên mayî hatibûn sîr kirin. Bi qasî şûna cixareyekê, zanava di dest min de, di nîviyê de, hatibû şewitandin.

Çûna vegeerê

Civata ferîştan li dare, hîne pir helpesar li pêşiya wanin ku nerînên xwe têde bidin, lê xweda nefesek da wan ku karibin bi mejiyekî vekirî û sayî vegerin û axaftinên xwe bajon serî. Berî ku careke din li hevdu bicivin, serdergevan dikeve hundir û rêdana hatina Şêxê Pîran ji xweda dixwaze.

- “Bila ew bê”. Bi gotina xwe re, ji ser daniştoka padişehiyê dadikeve û heye bi nivê odê tê. Daketina ji ser daniştokê bi ferîştan dide nasîn ku, mêvanekî bi qedir û qîmet dê têkeve hundir.

- “Silav li webe”. Piştî çûna dev- riwê hevdu, xweda ew bi xwe re derxist ser textê sultaniyê.

- “Ji zû ve tu nehatî mêvantiya min. Tu bi xêr hatî. Erê ji gerdişên mêvandariyêye ku yek heya bi sê rojan ji mêvanê xwe nepirse, hatina wî ji bo çiyê, lê tu ji malê yî, em te mêvan najimêrin”.

- “Ez we sipas dikim, ez jî wilo dibêjim û vê car ê hinekî bilez im”.

- “Ka bêje çi ji te re divê”.

- “Ez dixwazim tu rêdana vegeza min bidî, eger sê roj tenê bin jî ne xem e. Min bihîstî ku, te rê dayî çendekan”. Guh li ferîştan bel bû.

- “Bes tu dizanî ku kes ji wan negihîşt armancên xwe. Giş li rê ketin û heya bi nuha di zindana Ehrîmend de mane”.

- “Belê çîrokên wan ji min re nas in. Lê ewê nikaribin min ji vê reyê vegezin”. Xweda ne dixwest ku, mêvanekî mîna Şêxê Pîran, bikeve nav destên leşkerên Ehrîman de, lê nirînek li çavên kalemêrê rih- sipî, jê re dide xuyanî ku nema kare wî ji rê vegezinê.

- “Ezê rê bidime te û li şûna sê rojan hefteyek ji te re. Bes bêje min, çima tuyê vegezin?”.

- “Min agirek li şûna xwe hêştibû; dixwazim zanibim çi pê hat”. Kenekî kefnikî li ser riwê xweda belav dibe.

- “Ka wer ji min bibhîs û neçe”.

- “Bihîstin ne wek dîtinê ye”. Bi gotinê re, Şêxê Pîran radibe ser xwe. Berî ku ew ji hundir derkeve, Xewda deng lê dike û sê hevdeyên mûyê “kuriyê behrê”, dide wî.

- “Eger tu ketî tengiyan wan li hevdu bade, ewê bê alîkariya te”.

Şêxê Pîran kete ser reya vegeerê; Ew û sê hevdeyên mû. Di şevê zivistanê de, di bin kuliyên berfê de dimeşin. Li welatekî digere ku karibe eniya xwe li ser deyne û nimêja xwe bike. Bi rê ve gurên birçî didin dû rêçika wî, lê dûr- dûr ji wî di meşin. Piştî sê rojan digihe bajarê reşiyê; bajarekî ro windakirî. Di ber deriyê melekê bajêr de, şîneke giran li dar e; kesên wî bajarî bi tevayî kom bûbûn û dengê girî ewrekî reş e. Careke din wê qurbanekê ji dêwê ku di devê kaniyê de rûniştî bişînin. Melekê bajêr tu rê nedîtin. Her çiqasî keça xwe li şûn hêştibû û hêvîdar bû ku çareyekê ji dêwê xwîn- vexwar re bibîne û karibe keça xwe biparêze, lê keçên bajêr giş bûn qurban û çare ji wî re ne dîtibûn. Îro divyabû keça xwe jê re bişîne. Piştî ku qirika wî ziwa bûbû û nema karibû bê av çendekî din bijiya, rê da leşkerên xwe ku keça wî bend bikin û bibin. Kesên bajêr bi giriyekî bê hêsir û laşên ziwa li dû dimeşin. Şêxê Pîran dikeve nav qelfên xatirxwazan. Çend hêsir bi rihên sipî de diweşin; komeke zarok xwe davêjin hembêza wî, rûdêmê wî dalêsin.-Hêsir şor in; tîbûna mirov bêtir dikin-. Ew digihên nêzîkî şikefta ku dêw pana xwe xistî devê kaniyê. Divyabû keçik bi heft pêpelokan derdikeve cem wî. Dema ewê dikir ku derkeve Şêxê Pîran bi destan digre, dide şûn û di pêpelokan, yeko- yeko, re derdikeve. Her ku ji devê şikeftê ve nêzîk dibe, bihna genî wî dikizirîne. Di devê şikeftê de dibe sing. Heft lêdan bi xencerê, dê bihêlin heft serî biweşin, xwîn û avê tevlihev dibin û çemê Ferat carek din diherike.

Mizgîn digihê melekê bajêr. Kesê ku mizgêniyê digihîne wî seriyê xwe winda dike. Bi qîrîneke reş, leşkerên xwe bi ser Şêxê Pîran de dişîne. Fermana kuştina wî dabû wan. Lê berî ku siwarên reşiyê bigihên ser Şêxê



Pîran, ew hevdeyekê ji hevdeyên mû li hevdu badide û “Bozê Rewan” wî ji pêş siwarên reşiyê winda dike û ji kişwera xweda derdikevin.

Çend bîranînên Şêxê Pîran di kişwera Somer de.

Bozê Rewan, siwarê xwe li ser Çiyayê Kafkasê datîne. Berî ku nasbike li ku bi cih bûye, xeleka mar- dûpişkan wî dorpêç dike û didin ber xwe. Pir camêran di vî çiyayî de jiyana xwe winda kiribûn. Her çend gavan, komeke qoqên wan hildabûn ser hev. “Kî rokê ji devê min derîne, ewê navê xwe li ser eniya xweda binivîse”. Dema ku Şêxê Pîran pevoka çûyî li ser kevirê di devê şikefta, ku ejdeha têde rok bend kirî dixwîne, dest davêje xencera ber piştê. Bi serî- jêkirina wî re cobarên ronahiyê ber bi ezmên ve diherikin û mar- dûpişkên Çiyayê Kafkasê di qulan de diçin xwar. Piştî ku Şêxê Pîran rokê ji devê ejdeha direvîne, xwe ber dide ser Gola Reş û li kalemêrê, ku konê xwe di kenara wê de vegirtî, dibe mêvan.

- “Silav li Otnebiştîmê nemir be”.

- “Silav li Şêxê Pîran be. Reya te hîn dûdirêje, çend rojên xwe li vir bimîne”.

- “Te sipas dikim rojên min gûzên bi hejmar in”.

- “Bêje, te çi divê”.

- “Tiştêkî bi tenê; keleka te ji min re divê”. Şêxê Pîran dizanî ku, bêyî kelekê dê nikaribe “Gola Reş” bibire.

- “Ew ji te reye, bes haje xwe hebe. Divê tu xew nekî”.

Çêdekên ku, ji berî Şêxê Pîran ghiştibûn vê derê, û xwestibûn Gola Reş bibirin, bi stiranên Sîranata di xwe ve diçûn û ji Exîlos re dibûn qurban. Lê Şêxê Pîran haje vê yekê hebû, lewra dema ew ghişt qeraxa golê, herdu guhên xwe bi herî tijî kirin û di nav refê Sîranata re, li kenara din ya Gola Reş dadikeve, hêşt ku ew bi keserên xwe ve di kûraniya wê de winda bibin.

Piştî çend gavan, qirika wî ziwa dibe, xwe berdide ser Sarinca Keftaran, li ser bazingê wê mar- masî rûniştiye û geyayê jînê xistiye devê xwe. Şerekî giran dikeve nav bera wan de. Lê dema ku mar- masî di wî de Rustemê Zal dibîne, giyayê jînê ji devê xwe dêxîne, xwe berdide binê sarincê û kulemeke av ji Şêxê Pîran re dişîne. Ew radihêje kulma avê û geyayê jînê û dide ser reya kişwera Medya. Lê divyabû di ser Silat Koprîsî re derbas bibe.

Berî ku, Şêxê Pîran bigihîştta Silat Koprîsî divyabû derbasî bajarê Orok ba. Li pêş qesra Gilgamîş disekine, bi hezaran kesên bajêr derketibûn wê derê û ji melekê xwe dixwastin ku wê geyayê şanî wan bide, lê leşkerên Gilgamîş ew bi şûnde didan.

- “Ev çi ji melek dixwazin”. Şêxê Pîran, kesekî bajarê Orok digre û jê dipirse. Ew hinekî çav vekirî dimîne, lê dema bihna biyaniyê ji wî dike, bi kurtî li wî vedigerîne.

- “Em dixwazin jînê nasbikin”. Û gava dixwaze berve deriyê qesrê biçê, Şêxê Pîran deng lê dike, wê geyayê dide dest û berê wî dide dîwana Gilgamîş. Yekî din, ji bo mizgîniyê, seriyê xwe winda dike û careke din leşkerên reşiyê fermana kuştina wî distînin. Dihêlin ku mûyê dudiwan bikşîne û Bozê Rewan wî careke din winda bike û li kenara Silat Koprîsiyê deyne.

Ev rawestgeha wî ya dawiyê bû ku, ji wê cîhanê derbas bibe vê. Şêxê Pîran ê pêşî bû ku, di reya vegeerê de, gihîştibû vê qonaxê. Çendekên ku berî wî xwestibûn vegeerin, di qonaxên pêşî de ketibûn. Ji ber vê yekê her tişt bi wî nuhbû; divyabû reya xwe mîna mirovê kor biqelêşe. Ew hîne di wê sergêjiyê de bû, çend pêt li sînga wî dikevin. Dojeha cobarên xwêdanê di gewdê wî de vedibin û bihin lê diçike.

Berve kopriya ku, herdu cîhanan bi hev ve girêdide dimeşe. Dengê kenekî hêrs ji kûraniya Wêl- wêl Deresê tê.

- “Çima te hişt ku, bi te re têkevim vî şerî. Çî yê te ji jiyana derewîn heye; te çî jê divê. Evqas agir têra te nakê??”. Kor, serleşkerê Ehrîman, derketibû pêşiya. Şêxê Pîran, li ser piştta Gayê Pîroz bi canbazî li ezmanan lîstikên xwe dikirin û dixwest wî bi ser kopriyê de bişîne.

- “Bavê bav ne bav e û agirê ji êgir ne ti agir e. Dayîna agirê we arî ye û yê agirê min av e”. Bi gotinê re lingê xwe avête ser kenara Silat Kopisî. Nedîtina wê di bin lingan de dihêle ew ji dûzaniya xwe bikeve û di devê Wêl- wêl Deresê wer bibe. Kor ji berdefkên xwe re gotibû ku sîtila herî mezin ji wî re amedekin û dive pêtên agirê wê bigihên bin nênkên Xweda. Berî ku, Şêxî Pîran di sîtila Kor de cih bigre, hevdeya dawî ji mûyê Bozê Rewan dikşîne û xwe tevî wî li aliyê cîhanê yê din dibhîne. Lê Bozê Rewan di cih de dibe bapîsokek û bi ezman ve hildikşe. Stêrek nuh di eniya ezmên de tê nîgarkirin.

Gera Şêxê pîran di welatê Medyade.

Berê tevan li bakur e. Şêxê Pîran xwe berdide ser bajarê Amedê, li kolan û çarşiyên wê digere, bêyî ku bihna mirovekî bi ser keve. Bajar vala kirine û bi mardûpişkan û segên berdayî hatiye dagirtin. Çend caran xwestin êrîşî ser Ş. Pîran kin, lê bihna wî ew bi revandin didan. Berî ku ew ji deriyê bajêr derkeve, rêza xaçên ku ber bi bakur ve diçe dibhîne. Serok leşkerê Tirkan li ser gora pêşmrgê nenas sekinî û got “ne dût e ku ev kurd be” û kenekî bê sînor li wî dibarîne.

Bi rêza xaçan re ew derbasî bajarê Silêmaniyê, “Bajarê Mirinê” dibe. Ew çiqas digere ku rastî nîşaneke jiyane were, lê dest vala derdikeve; ji bilî kavilan, ti tiştî din nîşana jiyane ne didan. Dema siya kevokê bi ser dikeve, dide dû û di nivê bajêr de, li ber pûtê Xanî, Kak û Mam rabûne ser piyan. Şerekî giran di nav wan de pêketî, derdora wan bi komên hestiyên şikestî hatî dagirtin. Her çekê yekî dişke, wê kevoka ku siya xwe ketibû

ser Ş. Pîran, hestiyekî nuh jêre berdide. Dema ew radihêje hestiyekî, li ser “Made in Kurdistan” dixwîne.

Ş.Pîran ji bajarê mirinê ber bi başûrê Medya ve direve û dema qirika wî ziwa dibe xwe berdide ser çemê Efrînê, ew ji zûve hatibû dizîn û windakirin.

- “Ji bilî gola Ormiya nema ku tihna min bişkîne”. û berê xwe da Çiyayê Sablan.

Di roja heftan de ew dighe qerexa çiyayê pîroz. Soza wane ku piştî ew seriyê her çar marên ku, di milên Ejdehak de derketine jêke, agir dê li ser vî çiyayê pêkeve. Lê Ş. Pîran çiyakî rût li ber xwe dibîne.

## Pûtvan

Nirînine sareş li hev dibarînin. Destên ku şûrum tê de bi jor ve dikşin. Di hin cihan de, kirêc diherife, tîş- tîşî dibe; Avine zer- zelqoyî, di rengê nêmirovana de, ji birînên herdu pûtan diherike. Her, ku dilopek ji av nêma wan dikeve erdê- berî ku, di aso de winda bibin- Tê şewitandin. Li pêş deriyê pûtgehê, komik arî kombûye.

- “Ez ne vala me, ji lîzên we re. Ev bû çend carên min in, ez dibêjim we eger pûtek di nav destên min de be, divê ez dengên we nebihîsim”. Gotinin, solin ji ser lîvên pûtvan (Xewyaz) diweşin. Wî demeke dirêj ji şeveke sipîdirêj borandibû, bi meyzekirina şerê di navbera wan de. Gava dît ku, pûtekî destê yê din firand, û çend pêçemok li wî kombûn û di dîwêr de winda bûn, naskir ku eger li wan neke qîrîn, ew dê hejmara pêçemokan zêde bikin.

- “Kê gote te em dilîzin û ev gotina vala... yê vala kî ye?. tu çima me çêdikî?. Ka bersivê bide”. (Xweyaz) kûr li pirsê nihirî. “Pir bi ser xwe de ne ponije, ezê bêjime te”.

- “Berî tu dibêjî. Min ji zûde naskiribû ku, ev kesekî dîn e. Di hundirê xwe de, çiyak ji pûtan avakirî û hertim xwe bav, xweda dibîne”. Pûtê dest jêkirî, gotina hevalê xwe birî. “Eger ne ji valahiyê ye, te çima em... çima pûtgeh, te çima gerdûn afirand?!”.

- “Divê ez pûtê xwe yê dawî bi serî bikim”. Û bêyî ku, li herdu pûtên şerker vegere, û bersiva wan bide, dest avêt kêra kar. “Binhêrin yê ku, ji pûtgeha, buhişta min bireve, ewê bi hilma devê min bikizire û bibe komek arî li ber deriyê min”.

Herdu pûtan li çavên hevdu nihirî. Wan ev tişt xweş naskiribû ku, ew dê hertim girtiyên pûtgehan bin û eger rojekê kaniya azadiyê di seriyê wan de bi teqe, wê mîna ewan kevokan, di derî de bikizirin. Ev danstandina ramanan ku, di nav bera herdu pûtên şerker de çê bûbû, mîna kelemêşan di ezmanê pûtgehê de diçin û tîn. Ramanek ber bi (Xweyaz) ve difire. çavên wî didin dû, di kunçekî vala ji tînê, ji ronahiyê li stiwê kelemêşê dinin, û bi banga çav- mizgeftan re dest dixuşin. Mêşa reş di nav du tiliyên pûtven de berdavêje; geliyek ji nêma wê diherike. Dihêle ku, herdu tiliyan ber bi bêvilan ve bîne. Nêriyê ku, paşiya bizinê bihin dike, poz bi jor de hildide, û nefeseke kûr dikşîne.

- “Ket, ev cara yekem e wî dibînim ku, ew gêj dikeve”.Pûtekî gote yên dora xwe.

Wan ji zû de şerê xwe sar kiribû, û digel hevalên xwe yên di pûtgehê de, bi çavin bi tirsê avis bûne, li pûtven dinêrin. Gêjbûna wî ji wan re rewşeke nuh bû. Lê hatina çivîkeke hesinî li hundirê pûtgehê- gerdûne hêşt ku, nirînên wan bizên û çemek ji kevroşkan biherike. çivîka pereş, xwe ji ezmanên xewnan berda nîvê kefa destê pûtven. Kefa avis dizê û bi

rabûna xwe re zarokekî tazî, serjêkirî derdixê. Li şûna xwe çaleke vala; ezmanekî rût bê stêr û baran dihêle û hêdî- hêdî kurmên kor ji (Çala Reş) derdibin. Gava ku ew berî laşê wî dikin, ji gêjbûna xwe şiyar dibe û bi lepeke heriya kirêcê, valahiya dest tijî dike û rê li pêş kurmên kor digre.

- "Xwe da, xwe bi xwe da. Wî hertim digote me lê em bê bawerî bi derdiketin". Pûtekî destjêkirî gote nîv- pûtekî.

- "A nuha te bawer kir?". Pûtekî rihsipî lê vegerand.

- "Te bi çavên xwe dît. Ew ne bes kare me çê bike. Wî kefa destê xwe jî nuh kir".

- "Kê gote te ku, ew perspanê li wir xistî dê di wir de kefnikî nebe. Piştî çend rojan divê perspanekî nuh çê bike".

- "Çima?!". Pûtê destjêkirî, ji yê rihsipî dipirse.

- "Divê yekî teze û mezintir bibîne".

- "Ewê xwe ji nuh ve bide?". Pûtekî teze dipirse.

- "Na. Demên ku, ew bi tevayî bibe perspanekî kefnikî ewê destekî nebîne ku, bibe xwedayê xwe". Rihsipiyê pûtan got û xwe ji refa ku, li ser danîne tavêje erdê; hûr- hûrî dibe û bi babelîsoka ku, ji devê (Xweyaz) dikşe re, di îvên sola wî de winda dibe. Sîka pûtvên reş- mezintir dibe û tîn... baran û ronahiyê dide revandin.

- "Divê ez pûtê wê bighênim dawîyê. Ew çend rojên ku, ez tê de kar dikim, rojin mirî bûn. Divê nêrgiz bişewitin, stêrên zarokiyê vegeînîm". Bi gotinê re bîr bir ku, ji roja dest bi çêkirina pûtê wê kirî de, ew ne dîtîye. Kela ramûsanekê di dilê wî de dipişkive, kêra di dest xwe de tavêje û ji hundirê pûtgehê dertê.

Di paşevê de ji meyxa nê der- dikeve; dide ser reya mala (Raşêl). (Reyêke dirêj... û keçeke dirêj) bû. Di wê şevê de. çend stêr ziwa dibin. Kaniya, ku nuh li mala wan derdibe, dê bihêle bibe cîgehê civîna segan. Di eyne şevê

de, pûtê wê, piştî ku hêşt ew avis bibe, bi serdike. Zikê wê yê werimî jî, ji pûtên kevin re tiştêkî nuh bû.

Careke din di wê şevê de, piştî ku pûtê (Raşêl) ê avis bi serî dike û çend cixaran dimije, Qîrîneke kûr û ziwa dikeve guhên wî. Çavan ber bi pûtê avis ve dişîne. Dibîne ku, cobareke tihî di qirika wê de derbûye û pêmpilîkên sor bi ser herdu girên sîng de difirin. Çavan ji wê dişo dinhêre ku, çav di seriyên pûtên wî de dibirûsin, her yekî rahiştî şû...r...uma xwe û ber wî tê; li dora wî gustîleke baranê vedigrin. Hingê nas dike ku, (Raşêl) bû stêreke rijiya û vemirtî. Wan devên şûrên xwe bi xwîna wê vemirandin.

Di sibeheke bê cers de, ewrekî sipî...(Dê) bi dizî derî vedike ku, mîna her car, xwe bavêje henbêza ( Xweyaz) û bihêlin ewrekî reşî-avis li ezmanê pûtgehê belav bibe. Lê dema derî li piş xwe dihêle, ji bilî pûtekî kizirî û kêra ku, ji nav tiliyan ketî, ti tiştî din nedît.

## Medya

Piştî şikestineke riswa, ji hemêza pîreka xwe derdikeve. Hêdî- hêdî destê xwe yê çepê ji bin seriyê wê dikşîne. Kûr bala xwe dide sîngê wê, ku bi yek şêwî bihna wê dertê. Dinase ku Padîşaha xewê ew xistî bin baskên xwe. Ji oda razanê derdikeve û derbasî ya mêvanan dibe. Dest davêje kasêtekê û dixîne (miscelê), mûzîka stirana “Eyşa Ibê” li odê belav dibe. Cixara xwe kûr- kûr dimije, xelekên dû dertên, fereh dibin... ferehtir dibin. Yek ber bi wî ve tê; lê tê pêçan; xwe li qirika Mîr Cano dalîne. Bihin lê diçike, çav di serî de sor dibin; ji cihên xwe dertên. Lê dengê qêrîna wî dernakeve.

Di dema ku Mîr Cano dikeve devê xeleka cixarê, Padîşahê cinan komcivînekê, ji cinên herêma Efrînê re li dardixe; wan dide hev û bi zimanekî tirş loman ji wan dike. Heya roja îro Mîr Cano nebûye mêvanê wan, lewre ji du cinan dixwaze ku herin wî bînin.

Mîr Cano dibîne ku kasê gihîşte dawiyê; deng hate birîn. Hêz dide xwe ku rabe kasê vegerîne aliyê din. Lê ji berî wî destekî din xwe dirêj dike û riwê Medya ji piş derî derdikeve. Riwekî sar e; tîna rojên destgirtiyê jê nayê. Wî pirê caran, di demên ku bi tenê bi hev re dilîstin, digot wê: “ez li ser tiliyên xwe bi tirs im”. Gava wê dipirsî çima, bi dilekî sipî lê vedigerand: “Tirsa min ji tîna dilê te pir e, ku tiliyên min, mîna mûman, li ser riwê te biherikin”. Kenê wê jî dihêşt ku ew sersend bikeve. Medya ramanên wî naskirin, berkenî bû û seriyê wî xiste hembêza xwe. Lê Mîr Cano ew kutekuta, ku di kêliyên wilo de tîna bihîstin, ne bihîstin; naskir ku wî seriyê xwe daniye ser sîngêkî bê dil. Dil jê reviya bû. Hingê Mîr Cano behitî; ket. Berî ku ji behtiya xwe şiyar bibe û bixwaze van guhartinên, ku di pîreka wî de çê bûne, nasbike, wê nişka bûneke mezintir danî ber wî; jê xwest ku rabe cilên xwe li xweke.

- “Çi bi te hatî?! Hema li katjimêrê binêre!. Berdestê sibê ye.

- “Rabe, emê herin mala bavê min. Min xewneke ne rind bi wan dîtiye. Bi zimanekî ziwa vegerand.

- “Ma çê nabe em heya ro dertê bimînin?! Ew bûk û zavayê hefteyekê ne û wî nedixwast dilê wê bişkîne.

- “Ez banga xwe dikime te ku tu bilezînî. Mîr Cano nihirî ku çavên wê tijî hêsir bûne; mîna “Dilopeke Baran” ê bi ser lêvên wî de barî.

Şeveke Nîsanê ye. Lê şeveke sar û tarî ye. Bayekî tûj û qêrîn e; tûyê giyaneweran qij dike; dihêle konê tirsê, di dilê mirov de, bilind bibe; li piş her gavekê, dêwek li pêş te serî hilde. Di vê şeva ne xurust de, ewê kê ji



xew şiyar bike. Lê Medya bersiv da; “çima emê herin yekî ji xew rakin, ka em bi terekorê herin, erê hinekî şev sar û tarî ye, lê gund ne dûr e”.

Ronahiya çireyên tirektorê hinekî hovîtiya şevê ko kir, lê konê tirsî di dilê Mîr Cano de hilneweşand. Ev nelêdana sîngê Medya, dihêle ku xwaziya di devê wî de bibe mast. Bi rêva, çend caran, siyê hin mirovan ket pêşiya wan. Lê wî vedigerand ser dilê wêranketî ku, sîka darên zêtûnê, mîna dêwekî ji xwe re dertîne. Di wan kêliyan de eger karîba riwê yê li nik wî dimeşe bidîta, wê zanîba çi li benda wî ye.

Berî ku ew bighên gundê Miskê, dengê tirektorê vedimire; ronahî wînda dibe; Mîr Cano dixwaze jê peya bibe û zanibe çi çêbû. Bi dilekî vemirtî dinase ku ew, li şûna tirektorê, li darekî siwar bûbû. Di cih de ser-gêjî dikeve û dengên hin mirovan, ji kûraniya “Çaleke Reş”, dikevin guhên wî. Dikenake nikare çavan bipişkivîne.

Demeke giran û sar di ser re diçe. Padîşahê cinan fermana şiyarkirina Mîr Cano dide. Cinek berve wî tê, sivik “Ayetek”e cinan li ber seriyê wî dixwîne û pif ser riwê wî dike. Mîna ku yek ji xewa miriyan vegere, Mîr Cano çavan hildide, li dora xwe dinêre, dibîne ku di nivê komcivîneke jin û mêran de, li ser postekî, cih girtî. Di aliyê herî jorîn de riwê bavê Medya dibîne. Di nik wî de pîreka wî rûniştî. Ji wan û bi jêr de, malbeta pîreka wî rûniştine. Tikes ji malbetê nemayî ku di komcivînê de ne beşdar e.

- “Piyaleke av bidinê”. Bavê Medya dibêje kesekî destsipî. Lê Mîr Cano ti tiştî di piyalê de nabîne. Dixwaze, ji van pêkenînan bike qêrîn. Nasdike ku ziman jê standine. Piştî ku ewê destsipî piyala bê ji nav lêvên wî dikşîne, vedigere li cihê xwe rûdine.

Careke din bavê Medya dest bi axaftina xwe dike: “Ev bû hefteyek ku te keça me standî. Heya bi vê kêliyê te ew ji keçaniyê nekirî. Eger tu ne mêr î, çi yê te ji wê hebû”. Gotina bavê Medya mîna “Latê Sîzêv” bi ser seriyê Mîr Cano de tê xwar.

- “Ez nikarim hêsrên wê bibînim. Her ku min dixwast xwîna wê birjînim, min di çavên wê de didît ku min kêreke heşaşan xistî destê xwe û sipîtiya berfê, bi çilpikên xwînê, riswadikim”. Wî nizanî çawa û kengî zimanê wî vegevandibûn.

-“Tuyê nuha beşdariya mêraniyê, di kêliyên wilo de nasbikî”. Hîn wî gotinên xwe ne biribûn serî, deriyê şikefta ku komcivîn têde li dar xistine vedibe û riwê Onac Rîm dikeve bin ronahiya fîska ku di kuncikê pixarê de danîne. Ew kes, bi gavine bê dudilî, pêle Mîr Cano dike û berve kuncê şikeftê yê reş diçe. Bêyî ku mirov tiştêkî di wê tariya kunc de bibîne, Mîr Cano diheste ku Medya xistine wir.

Dema dengê girî û qêrîna wê bi aso û guhên Mîr Cano dikevin, ew ji cih tê avêtin. Lê ev werîsên ku lê hatine pêçan, wî ditevizînin. Tenê gotina na.. na ji wî derdikeve û di çirûskeke ronahiyê de, riwê xwe, di kuncikê şikeftê yê reş de, dibîne

1915

1915. Du caran yek. Her carek bi navê Yazdan ê dilovan. Sê caran susê, carekê bi hersê pirtûkan, cara din bi hersê pêximberan û cara paşin bi navê hersê miletan. Lê di dawiyê de pênc in. Qalûç e di destê xwedê de, li ber zeviyê zer sekiniye, bi her avêtinekê re pêncî serî difirin û careke din xak di xwînê de tê gevizandin.

1915. Dîrokeke reş e mîna riwê xweda. Sala şermiyê ye di eniya bablîska bîstan de, xwîşka mezin e ji sala 1988 an re. Li evê derê em du caran, di nav bera heft û nehan de, di bin sîka hersê sêyan, û yekî din de, hatine şewtandin.

Di roja ku, bi nav gund ket, di ro- nîvro de, seg nêwîn. “Ev yeka ji nîşanên roja heşer- meşerê ne”. Kalemêrên holê gotin. Piştî ku, çend malên pêşî birî bûn, di gedûka mala me de ket. “şeş roj û heft şevan ji xewa giran şiyar nebû. Di sê rojên pêşî de, kes ji gundiyan me nemabû ku, tiliya xwe di meselê venekiribû, lê bê sûde. Ew ji xew- xewa tirs û kuştinê şiyar nedibû. Di dawiyê de, pîrka gund fermana jê- gera wî da û got: “eger ev heft çilpikên xwînê yên di sipîka çavên wî de ziwa nebin, ewê ji xewa mirinê şiyar nebe”.

Heft- heft pirtûk, heft qatên ezmên, heft pirtûkên quranê, tev şeşên şewitandî;. Osmên fermana kuştina wan da bû. Heft rojên hefteyê, û heftiya mirinê. “Bi heftê û heft xweda û bi pisîka bi heft cana eger ev heft çilpikên xwînê ziwa nebin, ewê şiyar nebe”. Eve gotina pîrka gund, û tev dizanin ku gotinên wê ji yên xwedê ne; cihê pîroziyêne.

Piştî “şeş rojan û heft şevan” ew şiyar dibe. Xwe di nav komek jin û mêr de dibîne. “rih bûye bost lê dijminê ne be dost”. Li der dora xwe di zîvire. Heft çilpikên xwînê di nîvê odê de ji çavan di weşin, û heft termên zarokên ser- jêkirî şîn dibin.

Di wê şevê de civakeke fereh li odê digere, heya dengê mele û dîkan jî, nikarin ewê civakê ji hev bêxin. Rê û rêçik pirbûn, dîroka herêmê tev hate hilweşandin û tevdan. Lê mêvan ê me bê deng dima, kesên rûniştî çend caran xwestin wî ber ve xwe bikşînin, lê dest vala vedigerîn. Gava wan bawer kir ku, rûniştina wan bê kêr borî bû, ref bi ref belav bûn. min jî xwe di kuncê odê de lûskiribû; ez bi çavên mêvanê me di ramîm ku, çawa yek karê çavên xwe kesk bike, cara din şîn û carina jî reş, û di nav bêna her çendekî de kevokekê jê bifirîne.

Dema nîvro ji xew şiyar bûm, min mêvanê xewar li mal nedît. çend caran ji diya xwe pirsîm, lê wê bi kurtî li min vedigerand “mêvanek bû û çû

gundê xwe”. Evê bersivê ez têr nedikirim. Mêvanek şeş rojan raze, û di roja heftan de winda bibe!

Bîst û yek sal di ser hatin û çûyîna mêvanê me yê xewar re diçin; ew ji bîr dibe, lê carina mîna çîroka Erebê tirkirî gundiyan ew mêvan û xewa wî danîn zimên, nemaze di demên ku, yek daketa kaniya jêrî gund û xeleka wan heft darên ku, bi destê wî hatibûn çandin bidîta. “sed rihme li tirba Agob be, ev bû çend bav û bav li vê gundî çûn û hatin, lê kesî ji me bîr nedibir ku, rojekê şiqinekî bîne û li vir biçîne. Em miletekî ziwa ne”. gundiyan lome ji hev dikirin, xasma di demên ku li ser kaniyê, di nav sîka heft darên Çinarê de, yên ku kesî nizanîbû Agob ji ku anîn û li vir çandin, rûdiniştin.

Di dû van salên dû- dirêj de, ezê pir tiştan ji zarokiya xwe winda bikim. Yek jê çîroka Agob, lê di rojê sar de ku, heft şurik bûne yek, emê li hev rast bîn. Hingê min xwendina rojnemevaniyê kuta kiribû û li Cinêvê bi cih bûbûm. Di sibeyeke zivistanê de berî ku, ji mal derkevim zengilê telefonê lêda. Gava min xist ber guhê xwede, li aliyê din dengê hevala mina rojnamê hat. Bi kurtî û dengekî tijî hêsir got ku, hevlekî me yê rojnamê bi destê (Mît) ê tirkan hate kuştin.

Bi destekî sar û dilekî kizirî min telêfon girt û bêyî ku, qehwa sibê vexum, min cixareyek xitse nav lêvan û derketim goristana ku ji min re bi nav kiribû. Bi rêve pir wêne û bîranîn di ber çavên min re borîn, nemaze karên ku, wî di ber Kurdan de dikir, û tazî kirina wî ji hovîtiya ceneralên tirkan re. Piştî ku, ez gihîştim ber deriyê goristanê min bîr bir ku, min soza veşartin û amedeya ser gorê nebiri û rê nemabû ku, careka din telêfonê jê re vekim, û zanibim ewê ji kîjan kenîştê bi derkevin, lewra divyabû li benda wan bi mînim.

Di kêliya, ku min xwest ez herim di teksiyê de rûnim, çavên min bi wî ketin, kale- mêrekî heftê salî, li ber her gorekê disekine û gulên wê av

dide- Tîpê mirovê rojhilat xûyaye- dema wî li min nihirî du çem xwînê herikîn hêşt, ku destê xwe jê re hilînim, ew berkenî bû, ber bi min ve hat deriyê goristanê li ber min vekir.

- “Mirin tehl e, lê divê yek wê nasbike da, ku zanibe jiyan çiqwasî jehr e”. Ji kûraniyeke bê- binî gotinên wî der diketin. “Tu karî qurnefilekê ji wê derê jêkî”. Gava dît, ku ez dest vala hatime, tiliya xwe ber bi hevzoyê qurnefilan ve dirêjkir û gote min.

- “Te sipas dikim, derketina bi lez û ev nûçeya ji nişkêve hêşt, ku ez xwe ji bîr bikim”. Min xwest ez hatina xwe ya bê baxê gulan ji xwe û wî re bin cil bikim.

- “Şîna dawî be lawê min”.

- “Ne bawerim”.

- “Ka em herin hundir”. Kuştina minrovekî; di bajarekî Ewropa de, ê bihêšta yek bibehite.

- “Tu bi tena xwe dijî”. Ev tiştêkî pir normalbû, lê min xwest ku, ez ji nuhve deziyê axaftinê bikşînim. Pirsra min refek hecî lek- lekan ji çavên wî firand, nemaze piştî ku naskir hatina min a vê derê ji bo çî ye.

- “Ev bû bîst û yek sal û heft meh kêm sê roj, ku ez bi tena xwe dijîm”. Ev dîroka hûr hêşt bi min bide naskirin, ku çîrokeke dû- dirêj li pey wî heye.

- “Xûyay e ku tu ne Siwêsrî yî”.

- Tu jî wekî min î. Nayê veşartin, ger em çiqas jî kurkên wan li xwe bipêçin, nirîneke hûr li çavên yekî ji me, tu yê nasbikî ka tîna rojhilat di dilê wî de dikele lê na”. Berî ew rûne ber bi kuncêkî odê ve çû; du piyalên mey- vexwardinê anîn. “Di rojek mîna îro de, du tişt bi kêrî mirov tîna pîrek û enbî”. Bi gotinê re wî piyalek danî ber min.

- “Hejmartina rojan jiyanê tehl e”. Qurta enbîte gewriya min kizirand.

- “Eger mirov lawê miletekî, ku. melyon û nîvekî di navbera roj û şevekê de winda bike, be. Ewê li benda rojekê be û teneyên tizbiya dîrokê

bêjmêre. Lê mixabin xûyay e temenekî bi tenê ne besê yekî ye, ku bigihe wê rojê”. Piyala enbîtê ji ser lêvan vala vedigere. “mirovê Ermen ji bo tiştê tenê dijî; ji bo ku bîraniya wî neyê ziwa kirin”. Piştî demekê ji bêdengiyê û çend piyalên enbîtê, wî dest avêt hundir sandoqekê û solek zarokan danî ber min. “Salên wê di salên koçkirina miletekî deye. Tu dizanî, ku êşa miletekî nîşan dide?. Ev teka sola zarê min ê herî bi çûke, ew mîrasê min ê bi tenê ye, ku li şûna malbata min maye. Ji berî, ku meleyên wan bang bikin ew ketibûn gund û xwestin ji berî, ku ronahî belav dibe em ji gund derkevin. Kesî ne dizanî ewê berê me bidine kuderê. Heft zarên min hebûn, lê îro solek. Me gote wan, ku sultan bavê me ye û stûyê me jêre koprî ye, lê gotina me bê kêr bû. Bi rê ve çend siwar rastî me hatin û pîreka min birin; ez û heft zarokan sêwî hêştin, lê piştî çend gavan û giriyê pîrekê vegehrîn û zarê, ku sola xwe ji min re hêştîye, birin. Wilo çetirbû, wan nexwest ku ez barê xwîn û kuştina wan jî hilgirim; hinekî xaçê min sivik kirin. Bi rêva zikê şeş zarên min ê mabûn qelaştin, lê zêr di zikên wan de ne didîtin. Her ku min digote wan zêr di zikê min de hene, ew dikeniyên û digotin hûn Ermen pêlewan in, tu wilo nakî. Eger zêr hebin wê di zikê van zaroyan de bin, û kêrên xwe dişandin nav rovikên wan. Min heya bi demekê fêhm nekir çima ez nekuştim, lê gava ez bi xwe re birim (Van) ê û destên min xistin xelekên zincîra, ku heya bi (Bon) ê diçe min nuh fêhm kir, ku em êzingên dojeha wan in. Bîst û yek sal û heft zaro kêhm sê millet kî dizane ew çî ye? “Belê... dîroka solekê ye”. Gotina wî bi girî û lertzîna laş diçe serî.

Minê bihêştî ew devê kanî û şikeftên ku, bi çimento girtine hil bi weşîne, û mar- dûpişkan ji sîngê xwe bi revîne. Lê dîtina wan çilpkên, ku yekoyeko ji sola di nav tiliyan de dadirivîn ser sîngê wî, hêşt ez ber bi wî ve herim... û herim bêyî, ku karibim gava di nav me de bi birim û bigihêm wî.

Ez ji odê, derketim. Sibeyeke sar e. Di welatekî bê xem û solên birîndar de, ka mirovekî kuştî; mirovekî tazî, xewn windakirî, dê çibike, ji bilî ku li benda rojekê bi mîne. Bîst û yek sal, ji berî vê dîrokê ez hîne zarobûm; di şeveke sar de, mîna îro, ez di kuncêkî puxarê de rûniştibûm û min li çavên mêvanê me dinihirî, belkî evbû!

Çima ...?

- “Te çikir”. Mîna ku her çar li benda wê gotinê bin û ji xewneke reş şiyar bibin, ji cih hatin avêtin. Xewdiyê gotinê dest dide piştta Şêrgo û ji xênî der dixîne. Li derve, piştî ku bi çend gavan ji dibistanê bi dûr dikevin, nuh şik dibe şeşara, ku di dest wî de bû, veşêre û bi lez bi dûr dikevin. Tiştê ku, çêbûbû heya demekê ew lalkiribûn; ne dixwestin bawer bikin ku li şûna xwe laşeyek hêştin.

- “Em bi kû ve diçin?”. Dema Şêrgo dît ku ji gund bi dûrketin, ji hevalê xwe pirsî.

- “Divê em xwe çend rojan winda bikin”. Piştî hinek bê dengî careke din li wî vedigere; bi milên wî digre: “Çawa wilo bû û çima ?!”. Bi qehir dipirse.

- “Nizanim, ma te ne dît?”.

- “Min çi dît?! Em daxifin û hew min dît ku te dest...”.

- “Eger ew gotina navêta partî, tu tişt çênedibû”. Û dest avêt berîkê ku cixareyekê derîne.

- “Çima Xwedê mejî daye te?. Tu dizanî gotinên wî şaşin tu ya rast deyne ber wî; eger bawer nekir, kesên rûniştî karin gotina dawiyê bibêjin”.

- “Ez karim giştî daqirtînim. Bes ku gotinên kê m li ser hevalan bêm gotin, ez hîngê xwe ji bîr dikim”. Bê ku Şêrgo li hevalê pêre binêre, naskir ku ew nuha dibin simbêlan re dikene. “Ez dizanim ku hîn ji min û karê civakî re

gelek divê. Lê heya roja dawiyê jî- di jiyana min de- ezê di vê meselê de xwîngerm bimînîm”. Bi dawiya gotinê re di cih de rawestî û careke din ji hevalê ku ketiye Pêşiyê dipirse: “Te ne got, em bi kûve diçin?”.

- “Ên wek te cihên wan li seriyê çiyane”. Ew hinekî bê deng dimîne û piştî ku dûyê cixarê di bêvlên wî re diherike dîsa deng lê dike. “Ev xwînkela me yek ji sedemên bin destiya meye”.

- “Ez çî di pirsim, tu çî bersivê didî”. Dema xişiniyek ji kelema ku di ber de rawestî bûn, tê, Şêrgo careke din dest davêje paşilê, lê dîtina kûsî dihêle destê xwe vala vegeêne.

- “Tu tirsî?”. Hevalê wî bi henekî pirsî, lê dema ku nirîneke tûj ji Şêrgo dît, ewî tenaziyên xwe hêştin demeke din. Ev bû çend salin hevdu nasdikin, nemaze di vê dema dawiyê de ku divyabû bi hev re bigerin û her çendakî li gundekî bibin mêvan, da ku ew jî, di avakirina bingeheke civakî ye li pêş de, bi rola xwe rabin. Lewre ew pir tiştên kesîtiya şêrgo dinase. Erê, belkî kuştina mirovekî, di bin bandora hin tiştatan de, bi wî hêsan be, lê serjêkirina çivîkekê bi wî giran e.

Bê deng kete dû hevalê ku li pêşê dimeşe. Serî giran bûye; bi wêne û gotinan hatiye dagirtin “pîrs pirin, lê ev kesekî bê deng e”. Şêrgo dizane ku eger pîrsên xwe bibêje jî wê ti bersivan jê re nebîne. Demeke dirêj, bê deng li dû hev dimeşin. Ewê pêş radiweste, li Şêrgo vedigere û tiliya xwe berve şikefta, ku berî demekê lê civînên xwe çêdikin, dirêj dike.

- “Tu reya şikeftê dizanî. Derkeve wir û li benda min bimîne”. Bêyî ku ji wî re bide xûyanî ewê kûve biçê, xwe berdide ser reya ku diçe gundên Meydana.

Wan li şûna xwe Aramê Soro û kesekî din hêştibûn. Heya demekê ew bi derketina wan hest nebûbûn; bi xwe û birîna ku di milê Aram de vebûbû ketibûn. Ewî dest danîbû ser cihê ku xwîn jê di xil- xilî. Birîn hîn germe lê



hêdî- hêdî kabokên Aram sist dibin. Kesê ku pêre ber bi destmalê ve dibeze, dixweze xwînê hinekî pê bide rawestadin. Lê cihê wê asêye.

- “Destê xwe li ser biguvêje ta ku diçim otombêlekê tînim”. Bi gotina dawî re ji derî der dikeve. Dema ku vedigere dibhîne Aram bê- heş ketî. Wî radikin û dev didin bajarê Mêrdînê.

Di nexweş xanê de polîs kesê ku bi Aram re hatî digrin. Wî xwest çêrokê li pêş wan winda bike. Lê gava dinase ku seriyê wî dê têkeve teşqelan; ji tirsê ku Aram bi birîna xwe biçe û guman bê ser wî ew bêyî ku bibêje sedemên vê yekê meselên polîtîkî ne çêrokê ji wan re vedirşîne. Lê gava yê polîs dinase ku kesê bi birîn mamoste ye, gêre berî dilê wî dikin û di wê hîngê de sê kes dikevin hundirê nexweşxanê, dipirsin ewê birîndar di kujan odê deye. Gava yê polîs dixweze wan rawestîne, ew xwe pê didin nasîn ku ji hêza (Asayêsa rêzanî) ne.

Li ser têxt, Aramê Soro di riwê miriya de ye; ketiye bin xewneke giran, di navbera her çendakî de bê heş dikeve, Di hişyariyeke gêj de dibîne ku derî vedibe û çend kes derbasî cem wî dibin; li dorê dicivin. Dengê wan ne sayî ye. Careke din her tişt di bin perdeyeke reş de winda dibe.

Bi ketina xwe cem Aram û dîtina derziya sêromê di zendê wî de, yek ji wan sê kesên ku xwe di bin navê hêza (Asayêsa rêzanî) de dabûn nasîn li bijîşkê ku bi wan re derbas bûye dizivire û bi qehir jê di pirse: “Çawa bêyî ku em bên tu wî derman dikî?!”.

- “Tu rewşa wî dibînî; ew di nav bera mirin û jiyane de ye. Eger min wilo nekira, min jî li ser temam dikir”. Bêyî ku ew çavên xwe ji yên wî kesî derîne, gotina xwe domand;”min hîn dest nedayî wî û berika şaşarê hîn di cihê xwe de ye”.

- “Tuyî dest nediyê jî. sîromê ji زندان bikşîne!”. Dema dît ku bijîşk bi çavine behitî li wî dinhêre, li benda wan nema; bi hêz bi derziyê girt û kişand, hêşt ku xwîn di şûnê re bavêje. Gava bijîşk xwest ji vê yekê re bêje

na, wî kesî tiliya xwe di ber çavan de hejand û deng li herdiwên, ku pêra ketibûn hundir, kir: “Rahêjin wî û berî min derkevin otombêlê. ka kê ew anîbû vir”. Berve yê polîs nihirî û pirsî.

- “Di oda wî alî de me dayî rawestandin”. Got û bi du lingên lertzokî bi wî kesî re derket odê. Ewî jî dide pêşiya xwe û her pênc ji nexweş- xanê der dikevin. Bijîşk û çend xizmet karên nexweşxanê digel ê polîs di odê de dimînin. Gava ew li textê bi xwîn û vala dinhêre, hêşrek ji qehran re dirje. Di navenda hêza (asayêsa rêzanî) de, ew kesê ku, di meselê de bi Aramê Soro re mabû, çêrokê dike têt. Wî dixwest xwe ji lêdanê biparêze, lê bi dawiya çêrokê re ew, ber bi oda ku Aram xistibûnê ve, xuşandin li rewşa wî dinhêre ku di nav mirin û mirinê de diheje; ew hîn di wê sergêjîyê de bû. Ka çawa alîkariya wî bike... Derî vedibe û wî dibin.

Aramê Soro li ser textekî leşkerî dirêj dikan. Di ser seriyê wî re bijîşk rawestiya ye, li birînê dinhêre ku zengirî ye. Ji riwê wî dixuye ku pir xwîn windakirî. Li serdarê ku di nik de sekinîbû dizîvire.

- “Divê ev bi lez derkeve nexweşxanê”.

- “Çima ne li vir?!”. Serdar bi nermî, lê bi fermanî, lê vedigerîne”.

- “Te got ew birîndar e, lê ev kes ketiye taya mirinê. Ez nikarim barê vî karî hilgirim”.

- “Em ber pirsîyarê vê yekê ne, ne tu”. Bi qehir gote bijîşk, û pê da fêmkirin ku. “Tu ditirsî mirina vî kesî serêşekê ji tere çêbike, evê yekê ji bala xwe bavêje”. Lê dema ku, ber pirsîyar jê dixwaze ku wî bê benc têxîne bin kêrê û berka ku gihîştî hestû derîne, hîç mejî di seriyê bijîşk de namîne.

- “Bes ev yek çênabe”. Lê ew berkeniya ku li ser riwê wî hatî çêkirin û kişandina nefeseke cixarê bi sarbûna derketina rokê di sibeheke zivistanê de. Ew bi bijîşk dide fêmkirin; “Erê em ne bi lez in, lê tiştên ku em bi xwazin dê pêk bên.”

Qêrîna wî ber bi ezmên ve diçe. Heya ew kesê ku temaşa karê bijîşk dikir bawer nedikir ku hîn ev deng û hêz di laşê wî de mabe, û bê hemdî xwe berve derî bezî û girt. Gava bi şûnde vedigere, dengê terqiniya hêsin dikeve guhên wî; li biniyê sênika li pêş bijîşk dinêre berikeke ji ên şeşara neh di nav leka xwînê de dibirûse. Wê hingê kenekî mirî li riwê wî belav dibe. Dest datîne ser milên bijîşk dihêle ew ji cih vecinîqe weke ku tu wî ji xewneke giran şiyar bikî.

- “Te tişt ne dît”. Û destmaleke kaxizî dide dest wî. “Tu karî destên xwe bişo. Xweda tev karê te be. Bes wek me gotî, te tişt nedît”. Bêyî ku li hêviya pirsên bijîşk bimîne, ew ji odê derdikeve. Pir naçe şagirtekî wî dikeve hundir û rê pêşe bijîşk dike. Ew dixwaze bêje ku evê li ser têxt- a nuha bêtirî her demên din- bi hewceyî wî ye, lê derî vedibe û dest li pêş rêdixîne ku kerem bik ji vir û pêva karê me ye.

Aramê Soro nîvşiyarî dibe; janeke bê binî di kezebê de ye; dilê wî ji jêr ve hildide û vedireşe. Lê ji vê sibehê de ti tişt neketî zikê wî. Avinezêr di qirika wî re, bi ser textê leşkerî de, diherike. Berî wî bê benc têxînin bin kêra teraşê, hin caran, tiştên ku pêre çêbûbû dihatin bîrê. Lê nuha, ji bilî guloverin sor, ti tiştê din jêve nayên xûyan. Piştî demekê hest dibe ku cihê têde dirêjkirî hatiye guhartin.

Şev û rojekê wî bê deng di odeya mirinê de dihêlin. Di roja dudiwan de, piştî ku hinekî jana birînê ko dibe, Arê m dixuşînin odeya jiyanê, ji van kesan re, zimanekî wanî taybetî heye. Li piş maseya, ku di sîngê odê de danîne, mirovekî bê xewn rûniştî, heya bi demekê dihêle Aram û herdiwên, ku ew xistibûn nav xwede, di nîvê odê de bê deng rawestin. Dûvre carekê çavan hildide û li wan dinhêre, lê ji nuhve vedigere; pelên pêşiya xwe, bê armanc, tev dide.

- “Aramê Soro, di sala 1970 î de hatiye holê, di gundê wêranê de, herêma Mêrdîn ê. Di sala 1991 an de, ji dibistana bilind ya mamostetiyê derçûye.

Ev du salên wî ne ku di dibistanên zarokan de dersan dide. Wî çend dibistan guhartine. Hevalê Partiya (KUK) e, çend caran ji aliyê hêza Asayêsa rêzanî ve hatiye xwestin. Cara dawî di sala". Wî kesî di virde çavdêrka xwe danî ser wan pelan, û ber bi Aram ve nihêrî "Tê bîra te kengî bû?. wê hîngê ti tişt li ser te ne hatibû girtin; te her tişt înkâr dikir". Bi gotina dawî re ji piş masê derket û bi gihîştina ber wî şerqiniya şeqamekê bêdengiya odê diçirîne. "Herin şûşeyekî ji min re bênin". Wî ji yekî, ji yên ku bi Arêm re ketibûn odê, xwest û bi dilsarî vegeerî piş masa xwe.

Dema ku ewê çûyî tev şûşe vedigere, ewê piş masê bi wan dide fêmkirin ku wî li ser bidin rûniştin. Aram heya bi demekê nasnekir ev çidikin, lê gava bi wî digrin û dixwazin pantiron jê bikin, devê dojeheke qirêjiyê di dev û bêvlên wî de vedibe, dihêle herdiwên di nik wî de jê birevin û heya ewê li piş masê jî bêvlên xwe bigre. Lê careke din nîşanî wan dide ku karê xwe bibin serî. Di wê hîngê de her çar dengê giriyeke zarokan dibihîsin, lê giriye Aramê Soro nikare wî ji bizava şûşe dûr bixîne.

Ev bû sê roj ji bilî avê, ti tiştî din neketiye rovikên wî. Di kêliya ku şiyar dibe de jî, ji bilî êşa ji birînên wî tê, bihnek genî dike. Dest dixwe hundir derpiyê xwe; dibhîne ku bi xwîn û pîsiyê hatiye dagirtin, bê şermî digrî. Di wê hîngê de derî vedibe û bi panekê re kesekî nuh li nik wî kulor dibe. Lê Aramê Soro careke din bê liv dikeve.

Şêrgo heya bi demekê bê liv di cihê xwe de dimîne. Reşiya hundir nikare bihna genî veşêre. Dema ku guhên xwe tûj dike, nalîna kesekî di taya mirinê de tê wî. Bi dudilî xwe, berve koşa ku nalîn jê tê, dixuşîne. laşakî kefnîkî di wir de dibhîne, lê bihna wî dihêle jiyan di damarên mirov de ziwa bibe. Heya demeke dûdirêj wî kesî nasnake. Dipirse: "Ka vî çi kirî;gunehê xwe çibe jî, ewê ne li gor vê yeka ku bi seriyê wî kirine be". Dema dixweze cilan jê deyne, hiskîniyek ji nişkabûnê pê dikeve. "çawa...çawa di sê rojan de ew wilo guhartin û gihandin pileyekê ku ez

wî nasnekin”. Di wê kêlîkê de Aram çavan vedike û, bêyî ku binasê evê bi wî re kê ye, ji nuhve dide hev û bê guhdan laşê xwe bi dest wî de berdide. Şêrgo wî tazî dike û heya ku jê tê laşê Aram bi kirasê xwe misdide û tevî yên wî dixîne koşeyeke odê. Lê piştî ku cilên xwe li wî dike xwe li ber hevalkirê dibîne. Li dora xwe dizîvire ku hesîrekê bibîne û têxîne bin wî, lê ode odeya mirinê ye; ji bilî çend mişkên birçî ku li bendê ne yek xwe ji bîr bike û êrîşî guhên wî bikin, ti tiştî din nabîne. Di wê hîngê de çêjna tehliyê di bin zimanê xwe de dike, û ber bi kuleka derî ve dibeze. Bi vebûna derî re, careke din ew tê avêtin û di nik Aramê Soro de kulor dibê. Hîn wî bihna xwe dernexistibû, birûsa hêsin- di bin tîrên ku bi vebûna derî re derbas bûne- hest dike.

## Dilopeke baran

Piştî (15) e salan vegeriya Sûriyê, bê ku ti tiştî ji bilî valahiya soleke avêtî û bîranîneke kûr, ku di dil de şînbûye, bi xwe re bîne. Ji ber ku ti name ji mervên xwe re bi rê nekiribûn, ti kes li hêviya xwe nedît. Ji balefirgehê bi derket. Dest ji teksiyeke re hilda û ji ajovan xwast, ku wî bigihîne taxa (Çîyayê Seydo).

- “Hîne wek berê ye. Ti tişt ji bilî min ne hatî guhartin”.

Bi daketinê re naskir ku bê hiş ji ajovan xwestibû, li ber mala wî ya berî (15) salan deyne. Piçekê di cihê xwe de, sekinî ma, kesereke kûr kişand û li riwê xwediye dikanê nihirî; ew nasnekir. Lê mîna çirûskekê di mejiyê E. Miço de pêket.

Dirêjkirina sekinîna wî ya tevîzî, hêşt bala xwediyê dikanê, berve wî bê kişandin. çavên wan bi hev dikevin. Bîrên bîranînine kevin tînan vedan. Por û rihên sipî reş vedigerin. û gava ew kenê, ji aliyê Bêkes de, çêkirî di nîvî de tê birîn, bi hev re xwe davêjin hembêza hev. Çend kuzotên tozê tînan kuştin... serjêkirin û di kenê wan de wînda dibin. Demeke dirêj bê dengkirin dimînin. Piştî ku tînan hevdu bihin dikan, ji hev bi dûr dikevin.

- “Ez dixwazim derkevim jor”. Bê ku li rewşa hevdu bipirsin, E. Miço jê xwest ku ew derkevin (oda) jorî dikanê. Dema wî xwest di deriyê avahiyê re derkeve, hat bîrê ku pêpelok ji hundir dikanê jî dertînan (odê). Ji nuh ve vegeerî û ket pey Bêkes. Her ku pêpelokekê li jêrî xwe dihêle, bi salekê şûnda vedigere. Bi hejmartina (15) salan re kenî, hêşt Bêkes jê bipirse.

- “Tu bi çî dikanî”.

- “Bi te... bi xwe. Li dawiyê em giş bi hev dikanin”. Bi gotina dawiyê re, çavên E. Miço tijî hêsin dibin. Rojên buharê bi hêsin digrînan û deziyê baranê-hêsin ji pey hev kêmbûn; dihêlin bîranîna kûr, ya ku di dil de şînan bûye, serî hilde. “na... ez bi te digrîm ez ji te hez dikim”.

Bi van gotinên ji hev ketî, Bêkes wî ber ve xwe dikîşîne. Naskir ku ew vegeerînan berî nuha bi (15) salan. xwest ji pêş pîrsa wî bireve. Ew xweş dinase, ku ew pîrs wê bihêle herdu di binê benê werbin; bi ser dara benîştokê vebin. Lê E. Miço destên wî ji yênan xwe bernedan.

- “Ra..ş..êl”. Derketina navê çûyî, hêşt demeke dirêj, bi hêsin, bête şewitandin. Bêkes bihna kizirandina goşt kir.

- “Tu dîsan destên xwe bi agirê cixaran dişewitînan?”.

- “Tîştînan mirî.. xalî naşewite. Babetê neguhêr. Di van salan de çî bû. Ew li kûye”. Bêkes dît ku nikare xwe ji bin barê pîrsê bide alî; naskir ku ji bilî rastgotinê, ti rê li pêş wî tune ne. Lê gotin pêre dernakeve. û gava li çavên wî nihirî, bervê xwe jê guhart; heya nehêlibe hêsin û gotina “mirinê” di

çavan de bixwîne. Lê E. Miço nihirî, ku gorek di (odê) de şîn bû; dengê wî, yê ku ji bin berfa mezin diherikî, Bêkes tevizand.

- “Ça..a..wa”. Bi dengekî lertzok, gotin û çend didan, ji devê wî weşîn.

- “Xwe ji balkonê de avêt”. Bi bihîstina avêtinê re, çend dilopên xwînê, baranê di bêvlên E. Miço re avêtin. Hêştin çend gangilîyên sor di kefa destê Bêkes de bipişkuvin. Bi rûniştina wan re, di nav tiştên dikanê de, Bêkes du cixare vêxistin.

- “Ji kengî ve”. Dengêkî dûr, ji binê (VOLKAN) de derdihat.

- “Piştî çûna te bi du mehan”. Gotinên wî kenekî zer, bi bêdengiyê hatî vemirandin, ji hunava E. Miço weşand.

- “(15) sal in belê (15) sal in, ji bilî vê hêviyê, bîranîna kûr, ya ku di dil de şînbûye tune ne. çima...”. Bi pirsê birî re, demeke dirêj bê deng dimînin. “min bi tenê bihêle”. Bêkes xwest li cem wî bimîne; xwesteka wî bi cih nîne. Lê dît berger bê sude ye. Ew hişt û bi gavine çelmisî daket dikanê. E. Miço piştî, ku bi çend cixaran dem kizirand, çavan ji nav lingên xwe radike. Dîwarên nuh boyaxkirî, kevin vedigerin; boyax ji hin deveran dikeve û li şûna wê kaxezên rojnama, li ser çar dîwar û banê (odê) belav dibin. û hin gul, soline çelmisî, di riwê dîwêr de hatine çandin. Dem vedigere berî (15) salan.

- “Ka biqulêpe. Aliyê din çêtir e”. Bêkes jê dixwaze, ku kaxeza rojnamê bi qulbîne aliyê din, ji ber ku li wî alî wêneya keçikekê heye.

- “Çavên te ji bilî keçikan, ti tiştî din nabînin”.

- “Ma yên te hertim riwê xwedê di wan de şîn bûye”. Bi kenê wan re derî tê kutan.

- “Kenê we heya bi zikakê diçe. Ee..ew”. Ê mîna zarokan xwe bi banî de çedike.

- “Hêdîka keçê. Tu dibînî, ku banê (odê) li gor dirêjiya mirov e. Bes ji ku tuyê bigihînî ban”. E. Miço jê re got. Lê gotinên xwe yên dawî di nav porê

Raşêl de çandin. Bi vekirina derî re û çekirina xwe re, ew bezîbû hembêza wî; mîna pisîkan xwe di hembêzê de veşart, hinekî wilo bê deng man û ji nişka ve ken bi wê ket. “Tu bi çi dikenî”?

- “Ez bi te dikenim, ku tu mîna dîrakan sekinî yî”. Reşêl vegerand.

- “Nexem e, eger tu bi min dikenî, ez jî bi te digrîm”. Bi vê siwarkirina biyanî ji hevokê re, ji aliyê E. Miço ve, hersê kenyan.

- “Îro bû du car tu vê gotinê, ji min re, dibêjî. Xûya ye gelekî seriyê xwe pê bilind dikî”. Hevoka dawî gote Bêkes.

- “Haa... Hîne bihna wî di hembêza te de ziwa nebûye, te dest ji xwendina xwe berdayî û ketî dû wî”. Bêkes bi henekî li wê vegerand.

- “Eger dilê te bi me mayî, here balîvekê têxe hembêza xwe”. Bi gotinên xwe re, wê xwe di hembêza E. Miço de melisand. Ê hêdî-hêdî, mîna ku di xewê de bin, berve nivînan meşîn. Bêkes dît, ku rêxistina kaxezên rojnaman, li ser dîwêr, çû demek dîtir; bi nermî derî li dû xwe girt û ji (odê) derket.

- “Ez ji te hez dikim”. Raşêlê got.

Di jiyana xwe de, ya ku E. Miço sî sal jê şewitandî, hîn ev hevok û bi hesta, ku ji devê Raşêlê dertê, nebihîstî. Her ku ev hevok dibihîst, çend nêrgiz di dilê wî de dipişkivîn.

- “Bi rastî”. Bi devkenî lê vegerand. Wê jî bi çend kulemistan bersiv da. “Bes.. keçê. ez jî ji te hezdikim. Bi hêsrên te be, ji te hez dikim”.

- “Divê tu vê yekê binasî. Eger tu ji min hez bikî yan na, ezê li ser hezkirina te çavan bidim hev”. Bi gotinê re xwe avêt hembêza wî û ramûsanin, ji hemû deverên laşê wî, birin.

- “Bes tu dizanî, ku yeke din di jiyana min de heye”. E. Miço du cixare vêxistin.



- “Xwedê dikim bes bila ne Narîn be, lê eger ku keçên Helebê giş bin jî, ez ji te hez dikim. Eger tu rojekê ji min bazdî jî, ezê bi dû te dim”. Bi standina nirîn û ramûsanekê re, dikevin bin perda xewê.

Pênc heyv û bîst roj, mîna standina ramûsanekê, ji jiyanê difirin. Lê di (2) ê gulana (1979) an de bi hatina Raşêlê digel Narînê, nêrgizên dil tên pelixandin. Berî bi rojekê, giraniya qurşînê di dilê wî de cih girtibû. û pê hest dibû, ku sibe veyê ewê were rewisandin.

Di rûniştina hersiyar bi hev re digel Bêkes, ji wî ; ji Parîs tê xwastin. “divê tu xwediya sêvê bidî nîşankirin”.

- “Herin! Her kes ji yana xwe bijîn”. Bi gotinê re, jiyan ji nav destên E. Miço diherike. Piştî (15) salan ji Bêkes dibihîze, ku Narînê ew kirîbû. Lê gava dît ku nema dikare wî di nav lepên xwe de bigre, rahêştê û mîna piyaleke camane şikand.

- “Tu hîne rûniştî mayî”. Bi derketina xwe re Bêkes deng li E.Miço kir. Lê gava gola xwînê; gulîstana gangiliyên sor, ku ji pozê wî weşîne û di nav lingan de cih girtine dît, qîrîn bi Bêkes ket û bezî ser wî. Bi bayê wî re E. Miço di cihê xwe de diqulibe. Gava Bêkes xwest wî rake, çav bi nivîsandina. “Raşêl; ez ji te hez dikim”. ku di nav gangiliyên sor de hatî nivîsandin, dikevin.

Kek û Mam

Ev bû çend roj in zikê wî dêşe, lê ew guh nadêyê. Îro êdî nikarîbû veşarta, pêl li dû pêl e, nemaze piştî ku çend caran, bi zoyê dewaran re, çû seriyê din û hat; çend eyar cot kişandin. êş lê giran bû, her kêlîkê dihêst raweste û bihna xwe derîne. Dema gihîşt sînorê vereşiyê, zoyê dewêr berda, li

yekê siwar bû û ya din li dû xwe kişand. Bi rê ve çendên ku rastî wî hatin, saxî jê re xwestin.

- “Xwedê xêra te bide, tu çima zû vegeriyayî? Min dikir ku taştîyê ji te re bînim”. Pîreka wî, ji devê derî, derket û ber bi wî ve hat. Dema nêzîkê bû û madê wî yê zer dît, hinekî lezand, deng li lawê xwe yê mezin kir ku bê û alî wê bike, da ku karibin wî ji ser piştta qantirê dînin.

- “Çi bi bavê min hatî? Ew vê sibê sax bû û ti tişt li wî nexûya bû!!”. Wî hîn dixwest bidomîne, dê dengê wî birî û jê xwast ku here li amê xwe bigere.

Kurê panzde salî, her çend gav dikirin yek û berve girê “Ber Benê” dibezî. Dê jê re gotibû ku dê amê xwe li wê derê, li pêşiya karikan, bibîne. Piştî çend sed mitran, hinekî leza xwe kêmkir û dilê xwe jî, ji xwerna çend tûlên kerbeşê, nehêşt. Ji dûr ve sîbera wan dît, hêştin ew careke din bilezîne. Gava gihîşte cem wî, heya bi kêlîkê nikaribû deng ji xwe derxista.

Piştî bihîstina çêrokê, rahişt çovê şivantiyê û ji kurik xwest karikan bide ber xwe, bîne mal. Wî jî kêse rê girt û bi bez dev da gund. Li gêdûkê bihna xwe derxist. Mîna dêwekî kete xênî, ji berî wî jî çendek ji gund hatibûn û li dora Memoyê Şêxo bi cih bûbûn. Bi hatinê re, rahişt seriyê birayê xwe û xiste koşa xwe, du-sê deng li wî kirin, lê wî çav venekirin. Bi zorê sîngê wî hildide. Ji nuh ve serî danî ser balîvê û ji hemgundiyekî xwe xwest ku here tirektorê bîne.

Cihekî ji M. Şêxo re, di tilêra tirektorê de datînin, dev didin bajarê Efrînê. Piştî çend katan û nalînine kûr dighên deriyê nexweşxana Dêrsim ê. Bijîşk wî didin ber neynikê, raportekê ji wan re dinivîsin ku divê wî rakin bajarê Helebê. Di rojava de, di nexweşxana Serxoş de, textekî ji wî re vala dikan. Wê şevê wî bi dermanan dihêlin roja din. Piştî ku nalînen wî tîn birîn, Birîmê Şêxo kir- nekir ku karibe hinekî, li ser betaniya li erdê rêxistî, raze.

Lê te digot kulmeke xewê berdane çavan, di ber destê sibê de, hinekî raza. Li ser dengê keça li ber destê bijîşk şiyar dibe.

- “Divê em wî bibin oda tehlîlê”. Di wê kêlîkê de, xortek digel textekî bi loq dikevin hundir, M. Şêxo didin nav xwe û wî datînin ser wî textî.

Li ber deriyê oda tehlîlê, ji B. Şêxo dixwazin ku li wir raweste. Piştî demeke dirêj û kişandina panzde- bîst çixaran wî dertînin. Ber bi wan ve dibeze, careke din vedigerin oda berê. Di wê meşê de, çavên Birîm hertim li riwê birê ne; hinek ziwabûn di rû- dêmê wî de dibîne. Careke din wî vedigerînin ser textê berê. Ji keçikê dipirse, ka nesaxiya wî çi bû.

- “Piştî kêlîkê emê zanibin; a nuha tu li cem wî bimîne. Emê bîn we bibînin. Berî ku B. Şêxo careke din êrişa pirsan bibe ser wan, ew derdikevin. Heya bi çend katan şêt- mêt dimîne. Ji dîwarekî diçe yê din, di navbera her çend çûn û hatinan de carekê tê li ber seriyê birê rûdine. Di carekê, ji wan carên ku li ber serî rûniştibû, de siya kenekî zer û pirseke reş li ser lêvên wî dibîne, dihêle ew ji cihê xwe bê avêtin. Lê bi lez seriyê xwe vediçerpîne û wêneya jinbira xwe, ji ber çavan, dide windakirin.

Di çaxeke ne di bal de, deriyê odê vedibe, keça berê digel xortekî nuh, dikevin odê. Dibêje wî ku “emelet” ji birayê wî re gereke. Ka ew razî ye yan na. Bê ku zanibe wê çi bikin, seriyê xwe dihejîne.

- “Divê em bijîşk bibînin, da ku erêkirina te bidinê. Tu jî hesabê xwe û peran bike”. Dema xort hate ser sira peran, B. Şêxo xwest devê wî tijî xwîn bike. Dengê Memo ew qerimand. Ber bi wî ve çû, bi zor jê fêmkir ku ew gulmek av dixweze. Dema li xwe zîvirî, ji bilî valahiyeke sar, kesî din di odê de nedît. Xûya bû, di kêlîka ku wî bala xwe dabû ser xwesteka birê, ew herdu derketibûn. Wî hîn devê birayê xwe paqij dikir, careke din ew xort kete hundir û gotê ku, bide dû. Destê xwe berve têxt dirêjkir û got: “çawa emê wî bi tenê bihêlin?”.

- “Em te gelekî nahêlin”. Xort vegerand û derî li pêş vekir. B. Şêxo dide dû. Çend deriyan dibirin, li ber yekî veqetyayî radiwestin. Xort bi nermî lê dide; Piştî gotina derbasbin, derî vedike. Gava B. Şêxo dikeve hundir, kesê li piş masê rûniştî radibe ser xwe, danîştokê şanî wî dike.

- “Divê em bi lez zikê birayê te biqelişînin”.

- “Eger tu vê yekê dizanî, çima hûn sekinîne. Ev anîn û birina we, ji min re, çima?! Ne ezê zikê wî biqelêşim...Ev karê we ye”. Eger hinekî din pêde biçûya, wî ne dizanî dê çi pêra derketiba.

- “Belê ev karê me ye. Bes divê em zanibin, ka gûca te digihe tu buhaya “emelet” û dermên bidî lê na”.

- “Eger ez nikaribim, divê ew bimre?!”. Bi hêrs got û rabû ser xwe.

- “Na... wê hîngê, tu karî wî bibê nexweşxanên Hukumetê”. Bi tenaziyeke aşkere gotina dawî got, hêşt B. Şêxo mîna gurekî, bigurmije.

- “Ji bo ku wî bavêjin ser têxt, heya Xwedê çawa dike?! Nuha giştî bihêle û ya kin ji min re bêje; çiqas divê”. Bi lez beriya xwe vekir, da ku çi pereyên di wir de hene deyne ser masa reş.

- “A nuha wan bêle, dê gerekî te bibin. Bi hesab divê tu deh Hezaran bijmêrî”. Heya bi demekê wî ji guhên xwe bawer nekir, lê gava dîke li çavên bijîşk nerî, giraniya çiyakî li ser milên xwe hest kir. Ji sibê heya êvarê, bi pênc wereqan diçe merkirinê. Bi lez di seriyê xwe de gerand, divê herdu qantiran û çend kulekên dewêr bifroşe. Dîsan jî, hinek pereyên din, jêre divên.

- “Erê”. Di danîştokê wer dibe.

- “Keremke”. Bi dengê bijîşk re radibe û dide dû wî. û bi bangkirina, li keçikê, re careke din radihêjin Memo û wî li ber deriyekî nuh dihêlin û demeke bê dawî dikeve ser.

Dûyê çixara B. Şêxo heya qatê ezmên ê heftan dikişe. Riwê Xwedê û stêran vadişêre. Ev bû heft katên wî di ber textê birê de rûniştî. Piştî du

katên ku di oda qelaştinê de hêştibûn, mîna termê miriyekî, bê şiv û liv, li ser têxt dirêj kiriye. Newêrîbû careke din çavan bide hev; ditirse ku xew wî bidize û dengê birê li ber bê biçê. Vê yekê hêşt ku ew dûvkên çigarên bimije.

Deng bi mizgeftan dikeve, B. Şêxo hîn çixarên xwe dimije. Te digot qey kurm ketine çavan. Di kêlîka ku çavan, bê hiş, dide hev û xilmaş dibe, her heft zarên Memo serjêkirî, di peyîka xwe de, dibîne. Bi hêz şerwelê xwe dadiweşîne û direve. Lê her heft serî didin dû wî. Ew dilukume û dikeve erdê, bihn lê teng dibe. Zaroyên serjêkirî li ser kon vegirtine, çavan hildide, dengê nalînine kûr dike.

- “Kuder te têşe?”. Devê xwe dide ber guhê Memo; dixwaze dengê wî bibîse. Bêyî ku deng ji yê nexweş bê, dest ber ve piyala avê dirêj dike.

Çar rojên din, ew li nexweşxanê, derbas dikan. Di roja pêncan de, bijîşkê ku zikê Memo qelaştibû dikeve cem wî û ji B. Şêxo re dibêje: “Tu karî îro birayê xwe bi derîni”. Gava destan tavêje beriyê, dixwast pereyên wî bidêyê, lê dît ku wî deng li keçika berdestê xwe kir û gotê: “Têkeve pêşiya Şêxo û bibe ba xezîndêr”.

Piştî ku B. Şêxo û keçikê bi dertên, bijîşk berê xwe dide Memo û li rewşa wî dipirse. Gava ew dixwaze hinekî cih jêre fereh bike, bijîşk destekî datîne ser rehekî wî û dibêje: “Ez bi lez im.. Lê min dixwast ku berî tu derkevî gotinekê bêjime te. Binêr her tişt par û bext e. Para te jî tu bê zar herî”. Çav di seriyê M. Şêxo de ziwa dibin. Berî ku karibe deng ji xwe derîne, bijîşk careke din dest bi axaftinê dike. “Ev çend sal in te jin aniye?”. M. Şêxo du caran herdu destan hildide. “Ev bîst sal in. Eve...ti çare ji nesaxiya te re tine ye. Ji te de ye, tiştî pîrekê tine ye. Damarên mêranyê li cem te hişk bûne. Ev ne. Ji îro û duh ve ye. Ji roja ku tu bi zikê diya xwe ketî, li ser eniya te hatî nivîsandin ku tu yê bê zar biçî”. Careke

din destan li kaboka M. Şêxo dide, ku hinekî dilêşa xwe bide xûyanî û ji odê dertê.

Derî careke din vedibe, B. Şêxo yekî nuh li ser têxt dibîne. Eger ne ji solên li ber têxt bana -Ku ew yên Memo ne- wiyê derî bigirta û li oda bira tê de raketî bigeriya. Bi lez berve wî tê û dipirse:

- “Eger tu têşî, îro jî em dernakevin”. Memo serî diçerpîne; ji wî re dide xûyanî ku amadiya xwe bike û dixwaze ji ser têxt dakeve. Birîm destekî dixê bin milên wî û bi yê din bi destê wî digre, çakêtê davêje ser milên wî û bi giranî lingên Memo dixîne solan. Ji dema ku bijîşk ev barê giran daniye ser milên M. Şêxo û naskirina wî ji ne baviya heft zaroyan re, zemîn di çavan de reş bûye. Ji bilî naskirina bavê wan heft zaroyan, ti tiştî din di seriyê wî de nemayî.

Rê dirêj bûye. Bawer nake ku bigihe dawiya vê lîska zemên. Berî ku roj piçe ava dighên gund. Her kesên ku bihîstin ew gihîştî mal, li dorê dicivin. Xaniyê li ser du qentirman, bi gundiyên wan tê dagirtin. Heya şev dişke jî ew belav nabin. Lê kesî nikarîbû gotinekê ji devê Memo derîne. Dema hêviyê ji dengkirina wî dibirin, berê xwe didin Birîm û çêroka nesaxî û xistina nexweşxanê jê dipirsin.

Gundî belav dibin, M. Şêxo digel pîreka xwe û her heft zarên bavnenas dimînin. Ev cara pêşiyê- piştî van pênc rojan- bang li jina xwe dike; jê dixweze bê nav nivîna wî. Meyro bi zîzî berve wî tê û kirasê xewê datîne, dikeve nav destên Memo. Pêre ew, kêra ku hertim di dîşlikê de bû, dertîne û dide ser boriya nefesê. Dihêle lertzandin û tayeke bi hêz têkeve laşê wê.

- “A sayî dîne ber min. Kî ye bavê van zaroyan?!” Ken û girî yê Meyro tevhev dibe.

- “Eger ne tu bî, wê kî...” . Berî karibe pevoka xwe bigîne serî qerimandina devê kêrê, di eyarê gewriya xwe de, hest dike. Deziyekî xwînê jê kişiya; çend çilpik ketin ser balîva sipî.

- “Min got ya sayî”. Hinekî din kêr guvaşt. Sal û wêne di çavên Meyro de diqulibin. Vedigere berî bîst salan, hîn Birîm cahîl bû. Du- sê sal di ser bûkaniya wê re borîbûn û hîn ti tişt li wê xûyanî nekiribû. Di çar- şemekê de, Memo daketibû bazara Efrînê, ji dêvla wî Birîm çûbû cot, mîna her car Meyro taştî jê re kir hev û da ser rê.

Di ber serê cot re, Birîm li stûyê wê dine. Ew dike nake nikare wî torî ji ser xwe bide alî. Birîm, xortê gund yê bi nav û deng e, hîne ti kesî pişta wî nedayî erdê. Piştî ku wî ya ji Meyro dixwest bir, wê dide rûniştin.

- “Ev bû du- sê salên we ye hûn zewicî ne û ti tiştî li te bêlî nekirî. Eger ji wî de be jî dê bêje ez mêrim û dê jinek din bîne ser te. Lê eger ti tişt bi zikê te nekeve emê zanbin ji te de ye, wê hîngê divê tu bi bextê xwe razî bibî”. Ji wê rojê û pêve, dîtina Birîm û Meyro ji hev re, renekî nuh distîne.

- “Birîm e”. Bihîstina navê birayê xwe, dihêle kêr ji nav tiliyên wî bikeve. Bi hêz Meyro ji nav nivînan tavêje. Êşeke zirav di cihê qelaştî de vedibe, çend gelî dêv ji hev dikin. Bê deng radibe ser xwe, berve êxir diçe, hevsarê qantirê vedike, cilikekê tavêje ser û bi zor- zehmetî lê siwar dibe. çend kêliyên din pişkivîn û xwîn berve derpiyê sipî diherike. Meyro xwe davêje ligan; bi pana ku dide sîngê wê, dihêle ew li ser piştê dirêj bibe. Dev dide nav wan çend kurmitên zêtûnên qirêc.

Seriyê qantirê sist dike. Ew ji ber xwe ve rê nas dike. Seriyê wî jî bi ser milan de qulibiye. Çiqas car, di rojên ku wan taştîya bavê xwe dibir, bi hev re diketin ser vê reyê. Erê ew yê mezin bû, lê hertim Birîm yê pêşî bû. Di her tiştî de, ew yê yekê derdiket. Heya bavê wî carekê gote diya wan: “Eger tu bi ya min bikê, ka em Birîm di pêşî de bizewcînin”.

Di roja dewata wî de, gişan berê xwe didan Birîm. Lê Meyro, bi diltenikiya xwe, birînên wî vemirandin. Her ku ji çol û deştan vedigeriya û serî datanî ser sîngê wê, êşên xwe ji bîr dikirin. Nemaze di wan çend salên pêşîn de. Çiqas car ew ketine ser vê reyê û yek ramûsan ji nişkave ji riwê wê birine; hêştî ew bi zîzî bide dû wî.

Di dema Memo ketibû ser rê, Meyro bezîbû mala Birîm û ew ji nav nivînan kişand. Hêşt pîreka wî li kabokên xwe xîne. Bi nîv tazîbûn ew berve mala birayê xwe dibeze. Lê gava digihe hundir û nav nivîna vala dibîne, li Meyro vedigere.

- “Kanî ? Ez wî di nav nivînan de nabînim”.

- “Bilezîne, berî ku ti tiştî tîne seriyê xwe, bigihê”.

- “Çi çê bû ?”. Û gava li çavên wê dinêre, kabokên wî dişkên ku her tişt hilweşiya.

Bez û leza Birîm bê sûde bû. Ji dûr ve siya qantirê dibîne. Dema nêzîkî lê dike, dibîne ku siya Memo jî di ber de ye. Lê dirêjtirî her car e. Birîna kêndirê dihêle termê mirovekî, di çavên B. Şêxo de, bê xar.

## Zayîn

Ez dizanim, nuha li kenara bêheşiyê me. Kenara newêl. Têvedaneke sivik, babelîskeke biçûk, dê min di binîyê newêl werke. Nizanim newal e yan zozan e. Ne jî zanim, bêheşî newal e yan gir e!.

Pîrek: Min nizanî ku, ez evqasî bi ser wan de har im. Wan heya bêheşiyê dixwazim. Tim û tim, ez ji rêf qetiyabûm, xasma di warê civakî de. Her dem, tevizandinên min ên bi çûkanî, dema destên min di nav çîpên min de digeriyan, tên bîra min.

“Ewatêf, Rindê, Nadiya”. Nav in, gotin in... tîp û pirs in. Ev çi ne?!



Gewt- gewta cewrikekî ye, di riwê çend mirîşkan de direwê. Dezgeha mejiyê min nema digere. Çi dixwazim? Tu dipirsî, ez kê me? sinc û perwerên min çi ne!! He.. he..he... seg hîn û hîn...- bihêle, ez rûpelên jiyana xwe birêsim.

Famîle: Mîna her maleke rojhilatî, mêr û jinekê, di nav nivînan de ne. Bê lîsk û qurmiçandin lê siwar dibe, lingan radike ser milên xwe, awazine ji mûzîka “Ji bo çend Dolaran” dikutin. Helkiş, tengiya sîng û cirifandin dihêlin damarên xwînê stûr bibin; piçekî din dê di eyêr re derên. Kut- kuta dil zêde dibe. “Deh wesekên” wî, di damaran re diherikin, qîr- qîra wan e, lê kes nabihêse. çav beloq dibin, cilên wan bi xwêdanê tîş şuştin. Hevdu gez dikin; gezên segan. Li ser milan nîşana diranan dimîne, ji rengê sor dadigere şîna avgolên. Cendekê herdiwan sist dibe, gilêz ji çar devan diherike, zelqoyî dibin.

Ez kurê yekem im. Her şev dezgeha wan digere. Famîla me fereh dibe, em mezin dibin. Ê her şev em wan dibînin. Piştî em “radikevin”, ew dest bi karê xwe dikin. Dê; Dêwek e, radibe ser xwe, çavan di ser riwê me re digêrinê û hêdî- hêdî, xwe têve dide nav nivîna malxê xwe; di nav lingan de, keseran dikîşîne. Di wê kêlîkê de, laşê min ditevize, diderizim.

Em mezin dibin û dibînin. Mezin dibin na bînin û.....

Malbet: Mezin e û “hemd ji xweda re” bav- pîrên min, bav- bavên wan û... jin anîn, paspora jin- anînê sitandin û mafên çêkirina zaroyan birin. Lê piştî çend salan ji standina pasporan, zaro bi zikên wan dikeve. Sedema vê yekê, negihîştina dezgehên wanbû. Lê heya bi vê yekê jî nehêşt ku, zarzîçên wan pir nebin. Piştî ku, dezgehên wan digihêjin û dikemilin, te di dît mal bi zaroyan di milmilî.

Amo, tu ti rojan, ji keça xwe pirsî, çi di navbera min û wê de, di wî ciyê reş û germ de, ewê ku bihna rêx û fişqan jê dihat, çêbû?

Ez zanim wîn jê nepirsîne. Ev zaron e; tiştên wilo nizanin. Em lîstin û kenîn; lîska me ya bûk û zêve bû. Mazovan xwîşk û birayên me bûn, kurên amên hev in. Em, mîna we, bi tena xwe man. Piştî ku ka ji me re dûz kirin, ew ji şikeftê derketin. Dema em bi tena xwe man, me çav hildan ser riwê hev; ber keniyekê xwe, di çar kenarên gulîstanên çavan de, veşartî. Lê helkişiya we mezinan, me nizanibû; reya dil jê re girtîbû.

Xwe li ser piştê avêt ser kayê. Ji nêvî û jêr de tazî. Bang li min kir; bê şerm û tirs me dest avête pişkoka- na ne pişkoka, cilên me kiras û derpî ne-. Ji derve dengê mazovanan tê, dixwazin em bilezînin. Nîviyên me yên jêrîn hevdu dipêçin; hilma me germ dide, bi lez xwîn di damaran re diherike; em hevdu dişdînin, dibin candekê. Bê ku milan gez bikin û ti cilikan ji mirov û xisman re li bakim, da ku zanbin hîne ti kes derbazî gulîstana wê nebûye. û dîsa ji wan re xûya bikim ku tor im; karim di kêlîkekê de, baxên gulên wê bi rewisînim.

Xortanî: roj diçin, dimeşin... sal difirin. Em mezin dibin. Dev ji lîskên zarokiyê berdidin. Keçeke çarde salî, çeleng û memiksêv ji bûka min şiqin dide. Xwîna me “deh wesken” we dimije. Em ji hev dûr dikevin; me ji hev dûr dixin. Kincên wê tîn. Av di zikê erdê de zêde dibe, dibe gol... derya. Lê “Kevirê sîzêv” li ser devê kaniyê ye, nahêl çem der bibe, geliyên tî û kûr avde. Dixwazim wî kevirî bi aliyekî dim, lê giran e... Têvedidim, digivêşim. Çend dilop, ji aliyekî wî tîn. Lê dilopin nikarin “Çala Reş” û tî tîr bikin. Ew jî çiqasî wê çalê dikole, lê hertim ziwa ye, av jê hîlnade.

Malên me ji hev bi dûr dikevin. Carekê bi mêvanî tê cem me, mala amê wê ye. Raste em ji gund bi derketine, lê me xwe ji bîr nekirî. Divê sibê, berbanga sibê, bi dengê dîkan re, eger ti tişt tinebe jî, em ji xewê rabin. Bi piste-pista wan re çavan vedikim, belkî hinek gewzî, ji ya bavê, bidizim. Vê carê şaş çûbûm. Elendên rokê xwe berdane nav malan, li ser riwê keçikan, vehesa sibê didin xwe. Xwesteka wan e ku yek ramûsan ji wan

bidizin. Birayên min ên biçûk di nav nivînan de dilîzin. Ji berê û paşê de, xew bi min şêrîn e. Tev şiyar dibûn, lê ez na. Ew jî di nav de ye; ji wan dixwaze, hinekî dengên xwe nizim bikin ku min şiyar nekin. Piçek naçe xwestekeke nuh dike, ku ew bînan nav cihê wê û ew jî bê nav nivîna min, da ku di ber nigên min de “rakeve”. Zaro bi lîstkên xwe, ez bi “xewa” xwe û ew jî bi revîna nav nigên min, mijûl dibin. “Deh wesekên” we kelemîn, nahêlin ku ez rabim, pê bilîzim û tîna dil vemrînim; gulên sor bipişkivînim. Roja serşuştinê tê. Em bi vê gerdişê tînan naskirin: serşuştina roja înan. Em di vê rojê de, xwe ji karên çuyî dişon. Ez û wê bi tena xwe li mal dimînin. Derî li ser xwe digre. Ma çavên min ên girtî ne bes bûn? Kut- kuta dilê min e. Derî vedibe. Daxwaz ava sar e. Bi zor- xweşî divê ez jê re bînim. Ti kes ji bilî min û wê nîn in. Derî heya bi dawiyê li pêş min vedibe. Ew “deh wesekên” xwe ji bîr dike. Lê ez- bibore ji peyva “Ez”, xweda!- yek wesekên xwe bernadim; berê xwe jê dighêrim. Min destê ku misîn têde, bi dizî dirêj piş derîkir. Dema milên tazî dibînim, girîz bi devê min dikeve. Car kirin dudu; dîsa av hate xwestin û min jî bi şêwa berê av bir. Derî bi hêrs hate girtin. “Hemd û şîkur ji Xweda re”.

Mêr: serî bi êşe. Xew nayê çavan, pir şevan di nav nivînan de dikizirînim. Xwe virde- wirde toldikim. Bihna ramûsanekê ji bin balîvê xwe dikim, tînim bîra xwe. Hundirê min tê sotin. Ramanên min berve wan gerdişên şilo- Pilo diçin. Rast e xwîna min sar dibe, lê zelqoyî dibim, girîzokî dikevim. Mîna kurmikên di şikeftan de dijîn ji tînan û ronahiyê ditirsim.

Dawiya- dawî ez ketim bin perda xewê. Nizanim min xew girt yan ew li stûyê min nîşt. Xeweke giran e. Dema min çav, bi dengê lêdana derî re, vekirin, min nikarîbû pariyên xewna xwe berhevkirana. Bi lez ber bi derî ve çûm. “Kî ye ev?!” Diya şemo li ber derîbû. Ew jî ji kesên xewna min bû.

Bi tena xwe û zaroyan li mal e. Mêrê wê, ev bû mehek, ji mal bi derketî. Wek ez zanim kesa ku gewziya nav nivînan dîbe û demeke wilo dirêj jê bê birîn, mîna kuzotên agirê pixarê, di şeveke zivistanê de, ew diqij- qije. Nirînek ji min, yek ji wê; kanî dê derbin. Cahilê çerxekê û ne biyê rojekê. -Êvar li nivê meşînê ye-. Ramanek.... ez nuha rabim herim û tiliya xwe deynim ser pişkoka zêngil. Derî vebû; çav li xew in, di ber kirasê xewê de ye, gewd di bin de bang dike, du kevokên sîng dipirpitin. Di çavan de, pirsî hatina min e. Di baweriya wê de, kesê di vê şevê de deriyê wê bikute, ji bilî bavê Şemo, tikes dê tinebe. Na, ev kurê cîrana ye!! Gewriya min hişkbû, dengê min derneket. Bi tirseke berz, bersiva çavên wê didim. - “Diya Şemo, ji te fedîkarim, çi ji te re bêjim. Ez nivro ji mal derketim û nuha vegehm. çiqas min derî kuta, deng bi kesî neket. Kuva herim, ji bilî vir ti der li ber min neman. Bi hêvî me ku ez kilîtê li vir bibînim... Xûya ye ew ketine xew û dengê derî nekirin”. Berkenî bû û ji min xwest ku derbazî hundir bibim.

Derbaz dibim. Nikarim lerezandina laş vemirînim. Ne bawer im ku, wilo bi hêsanî, xwesteka min bi cih tê. Em bi hev re ketin nav nivînan û mûzîka “ji bo çend dolaran” me bi hev re li darxist.

Min êvarî, ramanên xwe wilo ristin û buheştêk ji xwere afirand. Lê bi bayê ber destê sibê re hilweşiya; ji min dizîn, ez jê hatim qewitandin. Ev xewn di bin çavên min re çû û hat. û hîne em li ber derîne. Min çav rakirin riwê wê. Ew- ew e, kenê bûdelî, li ser rû- dêmê belav e. Gava ket hundir, pirsî. - “Mala we kuve çûne?”. Bi pirsî wê re, ramanên min revîn û ji xewê şiyar bûm. Ez nizanim min bersiva wê da yan na. “Ez destê xwe bavêjimê, ber hembêz kim, an bi destan bigrim û rakêşim hundir. Lê eger got na û qîr kir. Cîran dê bicivin...”. Dîcivin, derî dikutin. Ne hêştin ku bigihêmin derî vekim, li ser me şikandin, civîn... guloverek li dora min girtin, dest

dirêjkirin, zincîrek- ji xwe- bi hev xistin. “Deh wesekên” wan, li derdora me, dikin qêrîn û... xencerên we têne xar.

## Dîn zêde dibin

Dînekî nuh li dînên bajêr zêde bûye. Ev bû hefteyeke ku ketiye bin bandora rewşa dîntiyê. Kesên bajarê (Efrînê); rûniştinên xwe pê derbas dikin. Zarokên bajêr jî lîstikeke nuh dîtibûn. Wan digot: “çima piştî sê heyva ma, û piştire, ew ket nav lehiyê. ewa me dizanî jî, Selmên hêşt, em têda nezan derkevin. Ne tişteki veşartî ye ku, yek di serpêhatiyan de, ji ser hişê xwe dere, lê ne piştî sê heyvan”.

Gava di seriyê zukakê re bi derket, careke din her pîrekekê rahişt zarên xwe û ew xistin hembêzên xwe. Nemabû ew wêribin wan bi tenê li devê deriyan bihêlin. Di navbera her çendakî de dînek di borê, û bi her yekî re ordiyek ji zarokên ku karin xwe ji lêdanên kevirên dînan biparêzin. Bi hatina her yekî re, ev ordî dimeşe. Tirsê pîreka mezin ji wan bû, ku keviyek rê şaş bike û cih di seriyê zarokê wê de bigre.

“Selman dînekî başqetir e”. Digotin. Veqetandina wî jî, ku ji refên dînan bi der dixistin, ji vê yekê di hate: Di vê hefteya ku dîn bûna xwe aşkere kirî de, ew wek bilî xwe nake; tikesî nedît ku, ew radihêje keviyekê û di zarokê mizeret werdike; her tim berîka wî tijî şekir bû. Eger bidîta zarokê şerê xwe ji ser wî naşo, dest dixiste berîkê û şekirek davête ser wî. Vê yekê hêşt ku ordiya li pey wî mezintirî her ordiyên li pey dînên din be. Heya hêşt ku dînên bajêr, di komcivîna xwe ya dawiyê de, li ser vê yekê rawestin.

Ket devê çarşiyê. Dengê wî û zarokan, ku ber bi guhên esmên ve dikişê, hêşt xwedyên dikan an seriyên xwe di derîyan re têvedin. Mirovekî cilên xwe tijî dike ye, dirêjîya wî nêzîkî li du mitran e sîngêkî fereh, di durvê wî re xûya ye ku, di demên ew neferekbû, hejmarek ji civatê dihat hejmartin, karê wî yê omizê û zendan bû.

- “Ka şekirekî, û ji te re zarokek”. Pevoka herî bi tenê ku, di vê hefteyê de, ji devê wî bi derdikeve, evbû. Eger xwedyê dikanekê bixwesta pençek şekir têxe destê wî, ji nûh ve vedigerand, radihişt şekirê xwe, dixist berîkê û dimeşî.

Çêroka “ Selmanê Dîn”, ji sê mehan û hefteyekê de, dest pêdike; ji roja ku, ji nişkava, pîreka wî xwest bimre. Di wê rojê de sê kemyonên çemento hatibûn. wî û hevalên xwe, yên di embara çemento de kar dikirin, divyabûn nanê nîvro jî li wê derê bixwin, heya ku karibin wan boş bikin. û berî ku roj di piş çiyayên Zagros wer bibe, zarokê wî yê deh salî, bi kel û girî, bi wir ket. Bê ferman û destpêk gotê: “Diya min mir”.

Heya bi demeke dirêj, wî bîr nebî ew çî dibêje. “Diya min mir”, bi rengêkî alavî, ev pevok bi derxist. Li çavên hevalê xwe dinêrî û digot. Ew jî, bê ku zanibin çima, wilo di cihê xwe de mabûn sekinî. Heya bi ewê ku tûrekî çemanto hildabû ser milên xwe, şik nedibû ji ser milên xwe bavêje; wilo dev jihevkirî mabû.

- “Diya min mir”. çima mir ?!. kê gote wê bi mir?. çima ew mir?. mirin çî ye?!. kî ye ewa mirî ?”. Ev bû çarde salin, ti caran nehatiye bîra wî ku rojekê bi vê yekê ponijîbû. Dîsa li zarokê xwe yê çav bi hêsir nihirî, û ji nuhve lehiya pirsan êrîşî ser kir. Lê bê deng destê zaro xist nav lepên xwe û hêdî- hêdî ji hewşa embarê derket.

- “Rûmetgirtina kesê mirî, di zû veşartina wî de ye”. Mele gotina xwe got. Xwest bi lez, axê bi ser kin. Goreke nuh bi du kêlikan, li goristana (Zêdiyê) zêde dibe; mêvaneke nuh dikeve nav kesên çiyayê Zêdiyê. Gava ew çend

kesên ku dev ji karên xwe berdabûn û bi cenaza wê re derketibûn, xwestin seriyê mêrê wê xweşbikin, ew ne dîtîn. Çendekan bi dengekî-dudiwan deng li wî kirin, lê bûbû pariyeke nan di devê segekî har de; kesî ew venegerand. vê yekê hêşt hîn zûtir vegerin ser karên xwe.

Di dema ku wan ax bi ser pîreka wî de dibarandin, xwe ji nav koma yê zindî dikşîne û berve wê qubeya ku bi rengê kesk hatiye pêçan dere. Dengê zîrkiniya derî dihêle refeke qirik, bi vebûna derî re, di esmên de winda bibin, û di nav deryayeke keskayiyê wer bibe. Di nîvê odê de tirbeyeke bi etlesê kesk hatî pêçan. çaxa berve kêlika li ber seriyê wê dinêre dibîne ku Ejdehayê gora Şêx diparêze serî ji nav kulora laş derdixe û bi çav melûlî lê dinêre.

Mirina pîrekê, neh zarok di stûyê “Selmanê Dîn” de hêştin. Neh civînok digel dînekî, li bajarê Efrînê zêde dibin. Her neh ji sibehan heya bi êvaran di nav kolanên bajêr de, li ser sergoyên bajêr digerin. Ji bilî bavê (Dîn). Dema ew vedigerîn mal, “Selmanê Dîn” nuh dest bi karê xwe dikir ku ji mal bi derkeve.

Derketina wî, heya bi sê mehan, dibin mij û dûmên de bû. ew bê şop, heya ber destê sibehê, dihat veşartin. Lê di vê hefteya ku dînbûna xwe aşkerekirî de, xelkên bajêr tê derxistin ku ew ji dema ro diçe ava de, heya berî dîk bangil bide, li nav mezel, li ber seriyê jinika xwe rûniştî dimîne. Kesên bi meraq ku bi xwestana zanibin ew çidike, wê biketana ser dengê kesekî azir ku axaftineke, fireh bi kêlika gorê re dike.

Her roj karê wî ev bû. Heya berî heft rojên dawiyê, wî radihişt çiqina nê û galonê avê. Şev bi wî xweş dibûn. Her tiştên li mal û bajêr diqewimî, gotinên pîrekên cîranan, îro zarokên kê û kê şer kirine, her tişt û her tişt ku çêdibû digote pîreka xwe. Pir caran, demên ku bê deng dima- carna ji qastîka wilo dikir- dengê wê diket guhên wî ku baxêfe ka çi tiştên din hene. Lê di roja dawiyê, ji çûna xwe ya ser gorê, de- ew di nav kefte-lefta

axaftinê de bû- gor li ser wan vebû, pîreka wî seriyê xwe ji bin milên ew kesê ku li ser sîngê wê mexelîbû bi derdixe, li kûraniya çavên “Selmanê Dîn” dinêre û gotinek bi ferehiya esmên belav dibe:

- “Derew in !!”.

## Lawên Beko

### Nimêj

Şimik ji lingên xwe avêtin, yek li ser dêv ket. “Şeytan dê nimêja xwe li ser bike”. Dengê diya wî mîna kêreke zingarî, xwînê mî ji serî wî dirjîne. Xwest vegere û şimika qulibiye rast bike, lê guneha wî bi Şeytên hat: “Çima em tev şerê wî dikin; ew jî mîna min (menboz) e”. Keysê dide wî ku, nimêja xwe bighîne dawiyê.

### Çixare

Çixara pêncan ji dûvkê ya çaran pêdixe: “Divê tu rojê çar cixaran tenê bikişînî”. Dengê dîlberê û giryê wê di guh de lûsdibin. Lê bi dûyê çixarê re wê dadiqurtîne.

### Tirombêl

Du tirombêl, ji hemberî min ve, tî :yeke leşkerî ye. Ajovan, digel hevlekî xwe, di kebîna wê de rûniştî. Ya din yeke Yabanî ye. Herdu bi hev re dixircilin, dişkînin ser hevdu û hindik dimîne ku li hev biqelibin. Leşkerê rûniştî, ji cihê xwe hildibe, li ajovanê Mazda qîr dike: “Ma tu ker î, tu pêşiya xwe nabînî ?!”.

Dema ajovanê Mazda gotinên wî dibîse, bi hêz dide pêşiya wan; rê dibire, dihêle ew ji neçarî rawestin û bi gotina “Te çi got”, ji tirombêlê peya dibe. Dengê bi hêz û hov bû, hêşt rû li ser yê leşker nemîne. Bi vekirina derî re, ji aliyê ajovanê Mazda, yê leşker dilbuhirî dikeve.



## Sûlav

Pîrekeke digel mêr û zaroyên xwe ve, li ser danîştoka hemberî wî, civîne. Pîrekeke ciwan, şox û şeng e, gewde berfa serê Sîpanê ye; rû heyv e, birî kevan e; bijan jî tîr in. Ling avêtiye ser ling, fistanê wê vekîşiyê; heya bi jorî kabokê dibrûse.

Li hember wan, xortekî gundî li ser çawîrê paldayî; paldaneke bi tirs û hejar e. Mêjî firîbû; çav girêdayî bûn; xwîna wî dikelî, dilop-dilop dibû ar di dojeha sîngê wî de diweşiya. Di navbera her çendakî de, çavên girêdayî, ji nav lingên Pîrekê vedike, li hawîrdora xwe digerîne ka kes li wî dimeyizîne.

## Berf

Rojeke sar û tarî bû. Kuliyan berfê dihatin xar. Dengê bê li derve dihêle mûyê mirov û lawiran qij bibe. Ev bû sê roj û sê şev, kes newêre ji hundir bi derkeve. Ezman hildiweşe. Ev cara pêşiyê ku berf bi vê harbûnê tê xar. Berf-di van sê rojên de- bêtirî bedena mirovekî ketî. Gundiyan zikê wê qelaşt, da ku karibin termê wî bi derînin.

## Zîndan

heya berî bi çend gavan, bihna solan bêvlên mirov tijî piş û pembo dike. Du rêz textên leşkerî rêxistîne, her rêzek deh text li jêr û mîna wan li jor in. Carina, mîna îro, giş tîn dagirtin. Cihekî vala nemaye ku yekî din hembêzbike.

- Divê ez li pê razêm.

## Zaro

Pîremêrekî daye ser rê. Hûrik- hûrik teneyên salên xwe diqulbîne. Li ber hinekan radiweste û kûr bi wan diponije; bûyerên wan vedijîne û di ezmanê çavan de winda dibin. “Çi reyeke dirêj e. Tu çima nabêjî lingên te kin bûne; di demên çûyî de, deh rê mîna vê têra wan nedikir ku ji hevdu vebin”.

Dîtina zaroyekî di Pêşiya xwe de, ramanan dide şûn. pîremêrê rêwî kêreke rind, di nav destên wî de, dibîne. “Ezê wî bitirsînim da ku, kêra wî jê bistînim”.

- “Birrr... Himmm...”. Pîremêr dikir himînî û berve zaro diçû.

- “Netirse, ez te serjênakim”. Zaro got û Pîremêr, li ser reya tirbeyeke dev- vekirî, li şûna xwe hêşt.

Dilsoz

Gava derî vedike, kenekî sor hildiperike çavên wî, bi misdana wan re, ew ken tê pelixandin.

- “Tu hîne di xewdayî”. Li dû gotinê dikeve hembêza wî.

- “Min îşev xewnekir, bawer nekir kengî sibe veyê”. Lêvên xwe bi ser ên keçikê de dadirivîne, wê ber ve textê germ dikşîne.

- “Bihna keçikan ji textê te tê”. Wê got.

- “Tu xweş dizanî ku ew bihna te ye. Bi seriyê bav- pîran sondê dixwim ku, ji bilî te, kesî nasnakim”. Wî got û mîna bazekî xwe berda ser sîngê wê.

Di eynî kêliyê de, deng ji telêfonê tê. Birçî ji ser sîngê wê radibe. Li aliyê din, dengê keçika ku duh naskirî, dike.

- “Bi bav- pîran, tu ya bi tenê yî”. Û ramûsanekê ji wê re jî bi rêdike

Dilêrî

Di welatekî kûnde û bi reşiyê sînorkirî de, serokê şoreşê xwe bihn teng dibîne. Ev bûbû sî sal di ser şoreşa wî re borîbû. Di van salan de, tiştên nemayî anîbûn seriyên milletê xwe. Di pêşî de wî bi tirs ferman û dadgehên xwe li dardixistin. Carekê ji wan xwest ku her kesek divê dûvekî bixwe ve xîne. Cara din ew tazî ketibû ser rê û kolanên bajêr, ji xelkê wê dixwest pesnên “taqima” wî bidin. Di gava ku, zaro bang dike: “Melîk tazî ye”, bavê wî destê xwe datîne ser dêv, termekî reş di nav destên xwe de dihêle.

Îro jî divyabû her kesê ku temenê wî bi ser heftê salî ketiye bide ser reya Paytextê, da ku li meydana wê werin bi darvekirin.

- “Werîs ji ba me ye yan ewê bidin me ?!”. yek pirsî.

Diz

Îşev pir gerî, lê ti tişt bi ber destên wî neket. “kesên vî bajarî mel’ûn bûne; heya mirîşkên xwe jî dixînin bin dêxûna xwe û pêre radizên”. Di paşya şevê de, dest vala dide ser reya mal. Demeke dirêj, di nav nivînan de, bê xew dimîne. “çawa dê xew bê çavên min, bêyî ku tiştekî bidizim”. Ev cara pêşî bû, di jiyana wî de, ku şevê bê dizî diborîne. Xwe ji nav nivînan dikşîne, li derve çavên wî pê dikevin; sola pîreka xwe didize.

Piştî dixê bin balîvê xwe, di xew ve diçe.

Çend (û çend) roj

Di jiyana pêximberê de

(1)

Li mûnşiyê li hêviya otombêlê bû, ramanên wî mîna gêrikan diçin û tîn; gid- gida wan di serî de bilind dibe; li derdora xwe dizîvire. Ew bi ber çavan dikeve, nikare salên wî binase. çav dibêjin em ên kesekî sîh salî ne; por dibêje ez çel im, dev û lêvên wî ên qurmicî dibêjin em ên kesekî heftê salî ne.

Ev kesê sal ne nas erebana xwe ya sêtekerî, bi herdu destan, têvedide. Li ser piştê wê sominine nerm hene, çendek ji refê pêşîn ketine. Wî piştî gereke dirêj hinek somin firotibûn. Di ber wan de çend şixat bela-wela bûbûn.

Cilên wî bi gemar, qirêj û qetiya ne, hestûyan serî tê re hildane. Por wek sirbigeyekê, di nav herdu milan de, serî hildaye. Belkî ne pore jî...Bi

dîtina polîsên belediyê re, wî xwe avête ser pişta erebanê û dema dît hembêzkirina wî ji sominan re bê sûde ye; dê her wan ji xwe re bibin, bi lez ew dixistin devê xwe, heya hêşt ku çav ji cihê xwe bi der bikevin.

(2)

- “Ezê li ser evê daniştokê rûnim; na, ya din nêzîktirî wê ye”. Rûnişt lê wê ne dît. Ew jî, ji bilî porê wê yê reş ku şeveke zivistanê tînê bîra yekî, ti tiştî din nabîne. Di wê demê de zarokê di pêşiya wî re dibore; cilên wî ne cil in, qetiya û bi qirêj in; porê guvrişkî ne ji dê û bavê xwe girtî. Di baweriya wî de ye ku, ti caran şeh reya poçê wî nedîtiye. Êv çiyê. Li pêş wî erebaneyê wêranketî -ew sûsfiroş e- bi herdu destan, têve dide. Lê bi rê nakeve. Hêza di mil û zendan de nikare wê alava wêranketî pêşve bide. Kesek ji cem jin û zarokên xwe hildibe, ber bi wî ve tê û, berî bighe cem, deng lê dike ku bide dû wî. Mîna cewrikekî stû xûz dike û dide pey wî kesî - “Çima ev tişt Xweda ?”. Wî xwest bigirî, belê giriyekekî germ ku bihêle ew ziwa bibe. Lê kanî ew sîngê ku karibe seriyekî wek ê wî hilgire ?!

(3)

- “Mirov e.. ?!”. Kesekî çel, pêncî û belkî heftê salî be jî, kesekî bê temen e. Bi rastî yek nikare jêre bi- bêje mirov e. Ne dûr e ku leylana mirovekî be. Riwekî tenik di ser de çermine qermeçî. Poç mîna rêlekê ye, tu çi dixwazî tiwê di nav de bibînî; kurm, kêz, kevir û daran. Li ser cilên wî mera, bilî ku karibe nav li wan bike, kare her tiştî bibêje; cilin ku gemar û pîsîtiya li ser wan hêştî ji hev neşelin. Li ber wî Xweda fedîkar derdikeve. Lawên Xweda, lawên Ewdul-lah werin binêrin ku, çawa dernece û cîhwar belav bûne. Dema ku nêzîkî wî dibe ji bihna pîsîtiyê gêj dikeve û kenekî bê sînor, bi wî û bi bajarê ku paqij dike, dike.

(4)

Çire sor e. Divê otombêl rawestin. Li pey hev zincîrek girtin. Ji hemû modêlan tê de hene. Ew di nav re dibeze, carekê cama vê, eynika ya din

û ya din misdide. stiriye zivitana ku zû hatî di laşê wî de tîn xwar. Ew cilên tenik nikarin xwe li ber wan ragirin. Dighe ber otombêleke qurşînî, yeke pan û dirêj e. Bi lez û hostekarî paçê di dest xwe de di ser cama wê re digerîne. Bi zanyariya xwedîkaran, naskir ku nîşana kesk nêzîk bûye. Dest ji paqijkirina wê berdide û xwe dighîne nik wî. Bi dilsarî berçavka reş ji ser poz hiltîne, nirîneke bê xem li stûyê wî yê xwar dibarîne. Pêlê benzîne dike; rê, bajêr û sîngê zarok diqelşîne.

(5)

Derdikeve ser balkûnê, dixwaze nirînekê ji keça cîranan bidize, tîrên çavan ber bi mala keçikê ve diherikin. Derî girtî ye, lê dîsan jî dikevin hundir. Bi stirî û neynûkên kulên birîndar vedigerin. Wî kes li hundir nedît, dengê stranbêj û tembûran nebihîst. Lê gulan gote wî ku îro roja derxistina hevala zarotiya wî ye. Di rojekê de, dêwekî ew bi rêve dîtibû, çavên wî pê dikevin, disekine û deriyê teksiyeke reş jê re vedike. Ew di cihê xwe de rûnişt û temaşa wan kir. Kenekî reş barî.

(6)

Zukak, yeke ji zukakên “Bajarê Mirinê” ye. Katjimêr devê kêrê ye; roj û şevê, ken û girî dibire. Bûyer, etarekî Sêv û Porteqalan erebana xwe têve dide. Wê jî bi destê zariwê xwe girtî û rakêş dike ku wî bi dûr xîne, da ku çav lê nekevin. Lê ew mesmûta ne diçû. çavên xwe ji wan der naxîne, girêz bi dêv dikeve û bi hêz destê xwe ji nav lepa dê derdixîne û êrîşî ser wan dike. Dema etar dibîne ku di nik wî de rawestiya ye û, bi harî, li barê wî dinhêre, riwê xwe diguhêre û hêsrek ji çavan tê xwar. Ev çekên perîşanî, qelsî û gidîtîyê, kesî bi xwedî nakin.

Ew kes, erebana xwe têvedide, lê zaro xwe nagire, bi mêranî dest avêt Sêv û Porteqalan, bi lez û tirs ew xistin hembêza xwe û xwest rê bibire. Lê otombêl di riwê wî de der dikeve, sêvan ji hembêzê di weşîne û qîrînekê ji dilê dê dikşîne. Çend kesên nêzîkî wê derê komdibin.

- “Sûcê zaro ye”. Yekî got.
- “Bavo, zaroyan tînin û nizanin wan çawa xwedî bikin”. Ê din got.
- “Zikan li hevdu diwermînin. Tuyê bibêjî neslê kevroşka ne. Sal yek zik yek. Nabêjin emê zikên van ji ku tijî bikin”. Ê din got.
- “Sedema vê yekê etar e. Eger ew ne li vir ba, ti tişt çênedibû. Gereke fermanek bi qedexekirina karê van cewrikan derkeve”. Xweda got û çend sêv, ji yên ku zaro direvandin, xistin devê xwe.

(7)

.....

Bêyî ku li dergehan bixe, derbas dibe, me di nav mij û dûmanê de kil dike. Mîna dêwê heftserî, li pêşberî me radiweste, tirseke bedew xwe berdide hinavên me. Wilo jî giyanê me radike ser piyan. Ber beriyeke bi dostanî, bi me re dike. Peyvên xwe, mîna xarên bi darên gulan ve, nîşanî me dike. Vêca pêwîste, em bi hayedarî, bi dûrwateya peyvê bi ramin. Li çirûskên melûl bigerin û bikin pîl bo pê di nav reşiya heyberê Pîr Rustem de çavan bi şahî bikin.

Tengezarê Marînî

\*\*

## QAQLÎBAZ

Werger: Osman Özçelik

Richard Bach

## QAQLÎBAZ

Werger: Osman Ozçelik

## WEŞANÊN FIRAT

"Ji qaqtibazên rastî re

yŞn di nava me de dijîn

## WEŞANEN FIRAT

Gulan 1994

Adres: Divanyolu Cad.  
Binbirdirek îşham N: 15  
Sultanahmet İstanbul  
Tel:516 05 91Fax:518 84 15  
Tiperêz-Montaj: HivdaYaşar  
Berg: Celal Aslan  
Çapxane: Eldim Ofset  
Wêne: Dogan Almasulu

RICHARD DAVID BACH

Di sala 1955'an de koleja bajarê Long Beach qedand.  
Ravesteka hewa û li ser sentrala Hêz'e xwend.  
Di 1975'an de Dinamik a hewa xwend. Di 1963'yan de  
bi berpirsiyarîya kovara hewatî yê ya Flying Magazinê  
ya bêşê Amerîka Rojava kir.  
Paşê bu pîlotê balafirê. Di 1965-66'an de di pisporîya  
ragîhandinê bira Li şîrîkatîya Mîdwest Aviation kir.  
Di 1974'an de pîlotîya pêşandeyê kir. Di 1975'an de  
dest bi mamosteyî ya Felsefa Firînê kir. Di nava  
1952-62'yan de di Hêzê Amerikayê Hewayî de vatinî  
kir. Ji 1959'an vir de rojnamevantîya serbixwe dike. Ji  
1970 û vir de Trans Creoture Airways'ê re peyivdarîya  
çapamenîyê dike. Richad D. Bach Li Newyork'ê dijî û  
endamê komela pîlotê jikarketîyan e.

Berhemên wî:

Stranger To The Ground (Biyaniyê Axê-1963)

Nothing By Chance (Tu Tiştî Nespêre Şansê - 1967)

Jonathan Livingston Seaquill (Qaqlîbaza Jonathan Livingston - 1970)

A Gift Of Wings (Xelatên Baskan - 1974)

The Advantures Of A Reluctant Mesîhekî (Serpêhatîyên Mesihekî Bidil)  
There Is No Place As For Away(Cîheki Wilo Dûrtir Nîne-1979)

## PÊŞGOTÎN

Pênc - şeş sal berê, hevalemî rexnevan salixa romanekê dabû .min. Min ev pirtûk bi dest xist û di hilmekê de xwend. Roja din min seh kir kû ez di bandûra wê de mame. Min rabû dîsa xwend.

Di nava jîyana rojane de pirtûk ji bîra min derket.

Belê çî çax min refekî qaqlîbazan bidîta an jî qaqlîbazeke bi serê xwe li asîman dawerivîya, qaqlîbaza bêtixûb Jonathan Liwingston û tekoşîna wê yî li himber kevneperestîyê dihat ber çavên min.

Û nivîskarê romana "Qaqlîbaza Jonathan Liwingston"

Richard Bach'ê Amerîkî dihat bîra min. Min ji

xwe re digot: Çî tişteki ecêb e kû nivîskarekî Amerîka yê nûjen ji qonaxa bi leza balafirê 20 seatî de, ji paş oqyanûsê destê xwe yî evînîyê û hevaltîyê dirêj dike û destê min dibîne. Êdî em bi elektronê evînîyê bi hevdû re têne girêdan. Ez bawerim ev pêwendîya, di nava R. Bach û xwendevanên Amerîka Latînî, Afrîka Başûr, Hind, Ereb û hwd. de jî pêk hatîye.

Ev çî hêzek xurt e. Ev ramanek çiqas dijwar e. Ev hêza wêjeyê ye. Ev hêza ziman e. Hêza ziman, wêje û evînîyê tixûban nas nake. Bi vî awayî aşbûn û yekbûna mirovatîyê pêk tê.

Çend meh berê bû. Min dît kû keça min ya çardeh salî, ji pirtûkxana malê ev pirtûk bi der anîye û hûr hûr dixwîne. Piştî xelaskirinê min, dîtiri û ramanê wê yî li



ser pirtûkê jê pirsî. Zehf ecibandibû.

Min wê rojê biryara xwe da. Min ê pirtûk wergeranda Kurdî. Bi xwendina careke din min dît kû pirsgirêkek girîng heye. Zimanê Kurdî yê kevnare ji yalî neyaran bi sed salan hatîye tixûb kirin, peyvokên nûjen, peyvokên nedîtbar di zimên de ya cîh negirtîye an jî roj bi roj hatîye ji bîr kirin. Zimanê romanê jî, bi xwezayî zimanê ramanî ye û bi peyvokên nedîtbar hatîye damezrandin û xemilandin.

Biryara min ya duyemîn, minê zor bida zimên û qasî kû dibe minê gotinên biyanî bi kar ne anîya.

Ser vê biryarê xeterek derdiket holê. Gelo çend xwendevanên Kurd wê bi hêsanî bikaribe bixwîne? Eşkere ye kû bê ferheng gelek rewşenbîrên me jî qenc nikare bixwîne. Belê xem tune. Bila ev pirtûk cîhê xwe di nava pirtûkên Kurdî de bistîne, bila deh an jî sîh salên din bi hêsanî bêye xwendin.

Ez bawerim kû navê Richard Bach û navê Qaqlîbaza Jonathan Liwingston wê bi sed salan di wêje ya Kurdî de bimîne.

Kû min di wergerê de kêmasî û şaşî kiribe, ez hevî dikim berêz R.Bach û xwendevanên hêja wê di min biborin.

Ez dixwazim di vê pêşgotinê de spasîyên xwe pêşkêşî nivîskarê "FERHENG Kurdî - Tirkî/Tûrkçe Kûrtçe" berêz D.îzolî bikim. Min ji vê berhema bêhempa qenc îstîfade dît.

O. Özçelik

ÎLON' 93 - İstanbul

## BIRRE YEKEMIN

### QAQLIBAZ

Destê' sibehê bû. Li ser ava bahra bédeng tîrêjên  
rojê yê zêrîn diçûrisîn. Şikevek biçûk ya masîvanan,  
bi qasî mîlekê ji derav bi dûr hêdi hêdi ava bédeng diqelaşt  
û pêşve diçû. Dengvedana şikevê ya di avê de, ji  
bo qaqlîbazan gazî ya "taştê" bû. Wê gavê, bi hezaran  
qaqlîbaz bi qîjewîj û bi lez bi hewa ketin. Rojek nû  
dest pê kiribû, rojek tijî xebat û lebat.

Taa wê de, pir dûrî deravê bahrê û dûrî şikeva masîvan  
qaqlîbaza "Jonathan Livingston", bi serê xwe ceribandinên  
firînê dikir. Ji rûyê bahrê bi sîh mîtroiyê bilind,  
lingê xwe berjêr, nukilên xwe berjor kir. Ji bo fitilokek  
bervaja êş da parxwanê xwe û baskên xwe vekê-  
şand. Kû bikaribe di vê de biserkeve, wê bikaribe ji  
berê zehftir hêdi bifire. Aniha bê, wek pisepistek hêdi  
rûyê wê dialast: Heta bahra hêşin ya di binê wê de, bi  
aşbûn dahat, wê jî, firîna xwe giran kir. Bala xwe zehftir  
civand, çavên wê hûr, hilma wê teng bû. Zor lê hat...  
yek... yeka din... hinekî din... du... sê santêm... wê gavê  
bayê kû ketibû bin perê baskên wê per li hevdû gerand,  
sekinî... û ket...

11

Hûn dizanin qaqlîbaz, tu caran naşewişin û bi vî  
awayî nakevin. Ji wan re, li hewa mêzîn windakirin û  
ketin şerme, rûreşîye.

Belê qaqlîbaza Jonathan Livingston ji vêya şerm nekir;  
wê ji bo, ji nû ve fitiloka bervaja bigerîne, baskên

xwe vekêşand û xwe giran kir. Bi vî awayî xwe da xûyan kû ew ne qaqlîbazek ji rêzê ye.

Piranîya qaqlîbazan, zêdeyî ziktêrîyê cehda hînbûnê nakin. Ji wan re yek mana firînê heye: Gîhandina xwarinê û vegera deravê. Armanca wan ne firîne, ziktêrkirine.

Belê ji bo qaqlîbaza Jonathan Lîvîngston ya girîng firîn bû, ne xwarin bû. Berî her tiştî ew dilketîyê firînê bû.

Wê dît kû ev mijûlî di nava qaqlîbazan de tew ne muhîme. Heta dê û bavê Jonathan jî, ji derbaskirina hemû rojên bi serê xwe ya li bilindayîyê, bi ceribandînên dawerivandina teyrokî, xemgîn dibûn.

Gava kû ji rûyê bahrê bi qasî baskekî bilind difirîya, didît kû bi hewldanek hindik dikare demek dirêj li hewa bimîne. Belê qaqlîbaza Jonathan bi sebeba vêya nizanîbû. Di dawerivandinê de mîna hercar lingên xweyî vekêşandî li avê nedixist, bi lingan li ser rûyê avê xêzikên nerm û dirêj dihişt û diçû. Lingên wê yî bi tehêrî bi zik ve zeliqandî ser şopa xêzikan av dialast. Jonathan li rexê avê jî dest bi ceribandînên dawerivînê kiribû. Bi dîtînên xêzikên ser qûmê tengezarîya dê û bavê wê zêdetir dibû.

Dîya wê pirsî: "Çima, Jon, çima?" digot. "Çima wekbûna qaqlîbazên din bi te giran tê? Ma tu nikare fi-  
12

randina nizamayî ji albatrosan û ji keravîyan re bihêle?

Tu naxwe û venaxwe. Binêre tu per û hestî maye."

"Ez dixwazim kû qaqlîbazek li hewa dikare çî bike

û çî neke hînî vêya bibim. Bi tevayî eve. Daxwaza min tenê hînbûne! Per û hestî mayîna min ne girînge dayê!" Bi dengekî nerm bavê wê got: "Li min binêre Jonathan. Zivistan pir ne dûre. Di nêzîk de wê şikevên masîvanan kêmbibin û masîyên rûyê avê wê xwe berdin kûranîyê. Kû tu dixwaze hînî tiştêkî bibe, hînî bi destxistina xwarina xwe bibe. Firîn xweşe, lê belê zikê mirov têr nake. Ji bîr neke, armanca firînê dîtina xwarinê ye.

Jonathan bi sernermî serê xwe hejand. Di rojên paşin de wek qaqlîbazên din jîya. Li rexê bahrê bi qaqlîbazên din re di nava şikevên masîvanan bi qîjewîj, bi dû hûrikên nê, laşê masîyan û qirş û qalan ket. Bi yê din re xwe noqî tiştan kir... şer kir... Belê bi tu awayî hînî vê jîyanê nebû. Fikirî û got: "Bêfêdeye!" Masîyek kû bi zörê bi dest xwe xistibû, bi qestî berda ber qaqlîbazek kal û birçî ya kû ew bi hevî dipa. "Ew qas tiştên kû ez hînbibim hene kû... Min dikarîbû ev rojên vala û bê mane bi hînbûna firînê derbas bikira."

Qaqlîbaza Jonathan, xwe di nava hînbûnê de dît. Demek dirêj derbas nebûbû ew li dûr, li gelekî dûrva bû. Pir birçî bû, lê belê dilgeş bû...

Hemû xîreta wê li ser firîna bi lez bû. Piştî xebata heftekê, ji qaqlîbaza bi leztir di vê babetê de pirtir tişt elimîbû. Di bilindayîya sê sed mîtroiyê de, baskên xwe bi hêz perpitand û xwe serîberjer berda ser pêlên bah-

13

rê. Di nava şeş sanîyan de leza wê gihîştibû heftê mîlî.

Te digot qey agir ji baskên wê dipîjiqe. Wê gavê pê hesîya kû çima qaqlîbazên din nikarin wisa pîke bikin.

Di vê lezê de xwedîtî li baskan nedibû û mêzîn winda dibû. Roj bi roj pêş ket. Berjewendîya wê bilindcîh bû. Tevî vê xebata bi sebr û hûr û kûr, di leza bilind de mêzîn winda dikir.

Rapelikî sê sed mîtroyî. Berê, xwe bi hêz pêş de avêt, paşê baskên xwe perpitand û berjêr pîke kir. Her car baskê çepê yî berjor vedibû, dihat girtin û bi hêz ber bi çepê dişemitî. Gava kû dixwest bi baskê rastê mêzînê bigre, îcar wek glokekê bi vîzîn ber bi rastê dizivirî.

Di berjorvekirina baskan de, baldarîya wê kêr bû.

Ev ceribandin deh caran ji nû ve kir, leza wê bi ser bîst mîlî diket. Her car mîna glokek per, zîz dibû û bi hêz li nava avê diket. Şilûpil bûbû. Di heşê wê de ramanek nû çûrisî: Wê baskên xwe heta leza pêncî mîlî bi hêz biperpitanda û di lezahîya mezintir de wê bask bêliv bihişt.

Ev nûvedana xwe di şeş sed mîtroyî de tetbîq kir.

Nikul dîk, ber bi bahrê pîke kir. Gava kû lezahîya wê gihîşt pêncî mîlî perpitandina baskan betal kir. Di vê ceribandînê de hêzek bêdavî diserifî. Belê biserketî bû.

Di nava deh sanîyan de lezahîya wê gihîşt nod mîlî. Dawîyê di nava qaqlîbazan de reqora dinyê şikandibû.

Çi fêde ev serketinek emirqut bû. Bi guherîna duqozîya baskan re hakimî leza xwe nebû û bobelatek bi xof hate pêşîya qaqlîbaza Jonathan. Bi leza kû gihîştibû nod mîlî li nava bahrê ket. Bahra di hişkayîya zinarekê.

Jonathan bi leza nod mîlî, li nava bahra di hişkayîya  
zinarekê de ket

Dema kû bi serxweve hat, ji zû de tarî ketibû erdê. Bes  
ronahîya hîvê der û dor rohnî dikir. Di nava oqyanûsê  
de wisa bêmecal avjenî dikir. Baskên wê bûbû mîna paçekî  
şil û wek gullê giran bû. Binketî bû. Bêderman, bêhevî  
û bêtaqet ketibû. Hêvî kir kû giraniya di stûyê wê  
de, wê bikşîne kûranîyê û her tişt wilo xilas bibe.

Gava kû binav bû, di hundirê xwe de dengê biyanî,  
dengê nayê dewisandin, dengê xerîb bihîst. Qedera  
mine, xilasî tune. Ez qaqlîbazekim, xwezayîyê min bitixûb  
xuliqandîye. Kû ji min re hewceya bi her awayîyê firînê  
hebûya wê şûna mejî, xerîtên minî firînê hebûya.

Kû ez ji bo lezfirînê xuliqî bûma wê baskên min mîna  
yê başokan kurt bûya. Ê şûna masîyan minê mişk bixwara.  
Ya bavê min rast bû, divê ez bipejirînim. Berjewendîyê  
min ew qase. Divê vegerim mala xwe û tev li  
refê xwe bibim. Divê êdî ez bipejirînim kû ez qaqlîbazek  
hatiye tixûbkin; hejar, reben û pepûkim.

Dengê kû ew xistibû nava van mijûlîyan hêdi hêdi  
kêm bû û di nava avê de winda bû. Di wê gavê de qaqlîbaza  
Jonathan sond xwar kû wê bibe qaqlîbazek ji rêzê.

Piştî rojava cîhê qaqlîbazekê rexê bahrê ye. Ê bi vêya  
herkesê kêfxweş bibe.

Ji nava ava tarî westîyayî rabû. Bi kêfxweşîya zanebûna  
qeydên nizm firînê, ber bi rexê bahrê firîya.

Ji nişka ve got: "Na! Ez ne tu tiştim. Bi hebûna  
xwe û bi zanebûna xwe ez ne tu tiştim. Ez jî qaqlîbazekim,

wek hemû qaqlîbazan. Naxwe divê ez jî wek wan bifirim. Ma nizm firîn tu caran li qaqlîbazan tê". Weha got û di nava êşan de rapelikî sîh û pênc mîtroiyê. Ji bo gîhandina deravê bi xîretek mezin bask çirpand.

16

Biryara wê kû ew qaqlîbazek ji rêzê ye, ew miferih kiribû. Ji êdî pêve wê li himber wê hêza mezin ya hînbûnê berwex bida. Ne dilşabûna hînbûnê û ne jî êşa têwerbûna avê nedibihîst. Devjêgera mijûlê, bi qelaştina tarîyê û gihîştina rex... û firandin... firandin. Ev çi tiştêkî xweş bû!

Reşayî! Dengê di hundirê wê de yê xerîb, nola zengilê hewarê çingînî da. "Qaqlîbaz tu caran di tarîyê denafirin!"

Belê Jonathan qasî kû vî dengê şîyarker nebihîze xwe dabû firînê. Çi qas xweşe, digot çiqas xweşe!

Ava kû di binê ronahîyê de dibiriqe, ev pêlikên bêdeng û di himbêza şevê de diçûrisin çiqas mirov şa dike.

Dakeve jêr! Qaqlîbaz tu caran di tarîyê de nafirin!

Kû xulîqandina te ji bo firîna di tarîyê de bûya wê wek kundan çavên te; wek başokan baskên te yê kurt û wê şûna mejî xerîtên te hebûya.

Li wir, li ser bahrê û bi sîh mîtroiyê li jor, di mejîyê qaqlîbaza Jonathan Lîwîngston de fikrek biriqî: Wê dilê xwe bi wxe neşewitanda û wê nerm nebûya.

"Baskên kurt! Baskên başokan yê kurt!"

Vaye ferisî! Ez çiqas bêaqilim. Kêmasîya min, pêwistîya min cotek baskên kurtin. Baskên kû bi laş ve

girêdayî û bes bi serê smûçkên baskan firandin. "BaskênKurt!"

Di reşayî û bêdawîya şevê de, ji fikrên mirinê û binketinê dûr, şeş sed mîtroyî bilind bû. Baskên xwe bi bedena xwe ve hişk girêda. Smûçkên baskan yê tûj ber bi bê û serberjêr berda, pîke kir.

17

Dengê hundirê wê: "Qaqlîbaz tu caran di tarîyê de nafirin!.."

Ba, di ser serê wê de wek himhima hûtan derbas dibû.

Leza wê berê gihîşt heftê, paşê nod mîlî... Û paşê sed û bîst mîlî... Hîn bi lez bû. Gihîşt sed û çil mîlî. Belê giraniya şidandina li ser baskan kêmî heftê mîlî bû.

Smûçkên baskan yê teng zivirand û bi zîvirokek zirav ji pîkê derhat. Wek gulleke zîvî, li ser pêlên kû di ranohîya hîvê de diçûrisî difirîya.

Çavên xwe ji ber bê û lezê girt. Bes qasî kû bibîne çavên xwe vekirî hîşt. Di hundirê xwe de şahîyek bê dawî his kir. Leza wê gihîştibû sed û çil mîlî. Û di vê lezê de dikarî leza xwe qontrol bike. Qaqlîbaza Jonathan di hundirê xwe de; li şûna şeş sed mîtro ez di hezar û pênc sed mîtro bilindayîyê de biketima pîkê, gelo wê leza min bi çi awayî bûya, got.

Sonda xwe yî demek berê ji bîr kiribû. Û bi hêza bayê xurt bi dûr ketibû. Teva kû sonda xwe xwaribû jî di dilê xwe de tewanberîyek biçûk nedidît. Sondê visa, ji bo qaqlîbazên ji rêzê bûn. Ji bo qaqlîbazek kû bi cehda giranbûha ya hînbûnê tijî, divê qîma xwe bi sondên wilo neynin.

Qaqlîbaza Jonathan bi hilatina rojê dest bi ceribandîna firînê kir. Rapelikî hezar û pênc sed mîtroyî. Di



nêrîna vê bilindayîyê de şikevên masîvanan li ser bahra hêşin wek tipikek biçûk dixûyan, qaqlîbazên ji bo firavîne kom bûyî, dişibihîn ewrekî ji tozê kû vir de û wê de dilive.

Belê ew, bi şikandina tirsê bi fêz û dilşa dijîya. Li hezar û pênc sed mîtroyî bû baskên xwe bi laşê xwe ve qenc girêda û duqozîya smûçkên baskan fireh kir û ber bi bahrê serberjêr pîke kir.

19

Qaqlîbaza Jonathan rapelild hezar û pênc sedmîtroyî Gava daket hezar û du sed mîtroyî gihîştibû leza dawîn.

Di vê lêzê de ba, mîna dengê dîwarekî hişk bû. Nedihişt leza wê zêdetir bibe. Leza wê bûbû di seatekê de du sed û çardeh mîl. Serberjêr ber bi avê dadiket. Heke di vê lezê de baskan veke, wê laşê wê bibe bi milyonan perçe û wê hûr hûrî bibe. Xwezi daqurtand... Belê lez; hêz bû, şahî bû. Lez, rindî û çelengî bi xwe bû.

Di sê sed mîtroyî de karê ji derketina pîkê kir. Ji ber bayê bi hêz xumîna smûçkên baskan bû. Refê qaqlîbazan û şikevên masîvanan li ser rêya wê bûn. Wek Stêra Rijyar bi lez mezin dibû û berpaş diqulipî.

Lez nedihat birînê, nizanîbû wê bi çî awayî xwe bizivirîne. Lihevketin, ji nişka ve mirin bû.

Çavên xwe hişk damiland.

Ev tiştan hemû wê sibehê, piştî rojhilat buhurî bû.

Qaqlîbaza Jonathan Livingston bi çavên girtî, wek gullê, bi qîjîna ecêbmayî ya kû bi bê re bilind bûyî ket nava

refê qaqlîbazan. Vêga ji wê re li hev hatibû. Mirin li wî alî, pozê kesî xwîn nebûbû.

Gava Jonathan nukilê xwe berjor kir, leza wê ya gihîştibû sed û şêst mîlî hê jî dûm dikir. Paşîyê leza wê daketibû bîst mîlî baskên xwe vekir. Edî li hezar û du sed mîtroyî bû. Şikeva masîvan li ser rûyê bahrê wek hûrikên nê dixûya.

Li serketina xwe fikirî. Leza dawîyê! Ev mûcîzek bû. Qaqlîbazek û di seatê de leza du sed û çardeh mîl! Di dîroka refê qaqlîbazan de ev demek nû, gavek me-  
21

zin bû. Û vaye, ji bo Qaqlîbaza Jonathan Lîvîngston rêyek nû vebûbû. Bi sere xwe, ji nû ve sererast firîya cîhê xebata firîne. Di pîka du hezar û çar sed mîtroyî de, li ser qeydên zivirînê ya di bin lezê de mijûl dibû.

Bi ceribandinê fehm kir kû, di serê smûçkên baskan de livîna perekî kêmi santîmekê jî, têra zîvirokek nerm û xweşik dikir. Di vê lezê de zêdetirî livandina perekî, besî wê weke firfirokekê doç bike dikir... Û di nava qaqlîbazên dinyê de Qaqlîbaza Jonathan Lîvîngston tenê fêrî aqrobasîya li hewa bûbû.

Wê rojê, bi hevpeyvîna qaqlîbazan wext winda nekir. Heta roj çû ava firîya, firîya... Avêtina teqlan, zivirîna hêdî û nerm, hûnîna berepaş û hînî holbûna niqta pêdandî bû.

Qaqlîbaza Jonathan nivê şevê vegeîyabû nava refê li rexê bahrê. Gelek westîyayî bû, serî lê gêj dibû. Dîsa jî, bi teqle avêtinê dest bi daketinê kir. Wê bi tevgerînek

zirav û bi dawerivîn daketin xilas kir.  
Fikirî kû bi ev nûvedanên wê yên nû qaqlîbazên  
din, wê ji şabûnê har û dîn bibin. Jîyan bi îmkanên xwe  
çiqas tijî hêjayî bû. Ji jîyanê bi dûketina şikevê masîvanan  
ya bêzarî wêdetir hêvî hebûn. Divêt kû jîyan bi armanc  
bûya. Em dikarin xwe ji nezanîyê veşon; Bi aqil,  
zanitî û di nava bilindayîyê de em dikarin bighîjin navoka  
xwe. Em dikarin azad bin, em dikarin hînî firandinê  
bibin...

Ji dempêşîyê deng dihat Jonathan û li peşîya wê,  
salên tijî hêvî hebûn.

22

Gava kû daket jêr, dît kû refê qaqlîbazan di komcivînê  
de ne. Dixuya kû ji demek dirêj de, di komcivînê  
de bûn. Te tigot qey li hinan dipên.  
Serokê komcivînê yê kalemêr bi dengê toq û serwer  
fena kû di merasîmê de be qîrîya: "Qaqlîbaza Jonathan  
Lîvîngston, derkeve holê! " Di gazîyek wilo de  
maneya rûmetîyek mezin jî û tawandin jî hebû. Belêheta  
aniha gazîkirina rûmetdariê, ji bo hîlbijartina serokê  
qaqlîbazan pêk hatibû. Jonathan fikirî û got, belê! Vê  
sibehê gava kû bi hevdû re firavîn dikirin nûvedana  
min dîtin! Belê ez naxwazim bê me xelat kirin. Ez tu  
caran li vêya nefikirî me. Armanca min ne seroktî ye.  
Daxwaza min li hev par kirina tiştên kû ez hînê bûmê  
ye. Min dixwest, ez li himber me hemûyan asoyê balûpal  
vekim. Bi ev mijûlîyan ber bi ortê meşîya.

Serokê komcivînê yê kalemêr got: "Qaqlîbaza Jonathan

Lîvîngston, li ser navê şermê derkeve holê û di bin nêrînên qaqlîbazên hevalên xwe de biçûk bibe!" Bi bihîstina van şoran, wek mîrkutek li serê qaqlîbaza Jonathan keve. Kabê wê sist bû, perên wê daket jêr, gêj û teyš bû. Li ser navê şermê derketina holê! Na, nabe!... Le nûvedana wê... Tê nagihîjîn!... Dixelitin, dixelitin!...

Ew dengê toq û serwer dîsa hat bihîstin: «...Bi bêmesûlîyetek bêperwa şikandina qedirbilindîya komela qaqlîbazan û pêlêkirina kevneşopîyan...» Mana vê tawandinê, bi dûrxistin bû. Nefîbûna bi serê xwe li dûra, nava serê zinara ya derî komela qaqlîbazan bû.

23

Serofcê qaqlibazan got: "Hatina meya vê tf/nyê ne>' bofirîne ye, ji bo ziktêrkirinêye!" "... Qaqlîbaza Jonhattan Lîvîngston, tê rojekê têbigihîjê kû bêberpîrsîyarî rêyek girtî ye. Nepenî ya jîyanê bêgihîştine. Hatina me ya vê dinyê bes ji bo tişteki ye: Dîtina xwarinê û qasî kû dibe jîyanek dirêj." Di pîrsyarîya komcivîna qaqlîbazan de kesî nikarîbû xwe bi parasta. Belê qaqlîbaza Jonathan bi qîrîna dengê xwe ev qeyde jî şikand. "Ev hezar sale em li dû serê masîyan dibezin. Bes îro ji bo jîyanê armancek me ya din heye: Hînbûn, azadbûn û himbêzkirina nûjenî yê. Gelî birano, ma ev bêberpîrsîyarî ye? Kîjan qaqlîbaz, ji qaqlîbazek kû li dû jîyanek bi wate û bi armanc digere bêtir bi berpîrsîyarîye ?... Şansekê bidin min,

şanseke bidin min kû ez, hînbûn û nûvedanên xwe bi we re par bikim."

Te digot qey refê qaqlîbazan bûye kevir.

Paşê hemîyan bi hev re gazî kirin: "Biratî mir!"

Wek bi hev re şewirîbin, hemîyan piştî xwe danê Jonathan.

Guhên xwe girtin... Danişîn xilas bû.

Qaqlîbaza Jonathan rojên xwe yî mayî bi serê xwe derbas kir. Ji heremê zinarên asê, ber bi heremên din difirîya û heremên nû kifş dikir. Xemgîn bû. Belê çavkanîya xemgînîya wê ne bi tenêbûn bû. Xemgînî ya wê ya esil, ji ber bêbawerîya qaqlîbazan bû kû bi hêza firandina xwedayî nedinasîn. Ew ji nêrînê tirsîyabûn, ji pêşdîtîna revîyabûn.

Qaqlîbaza Jonathan, roj bi roj hînbûna xwe zêdetir dikir. Edî dikarîbû di leza bilind de xwe noqî avê bikira û masîyên kû bi tam û nedîtî bi sê mîtroiyî di binê avê de binêçîrîya.

25

Qaqlîbaza Jonathanji heremên zinarên asê, ber bi heremên din difirîya û heremên nû kifs dikir. Êdi ji bo jîyanê pêwistîya wê ne li dûgerîna şikevê masîvanan û ne jî li dûgerîna hûrikên nanê kufikî bû. Hînî xewa li hewa ya li ber bayê hênîk kû ji reşayê dihat bûbû. Bi vî awayî dikarîbû ji rojhilat heta rojava sed mîlî bifire. Qaqlîbazên din, di rojên hewa xirab de li rexê bahrê dilûsiyan, wê jî mijên reş û tarî diqelaşt û digihîşt asîmanê rohnî kû çavên mirov bi ronahîyê diqemisî. Li piştî bayê kû xwe digîhand kûranîya reşayê

siwar dibû, li wan deran kêzikên tamxweş bi dest dixist.  
Demekê ji bo refê xwe çî difikirî, êdî hemû tişt bi  
serê xwe bi cîh dianî. Hînî firandinê bûbû. Û ji ber vêya  
ne poşman bû. Ji ber bedêla wê dabû.

Qaqlîbaza Jonathan, ji zû ve elimîbû kû; Tirs, hêrs  
û bêzarî vejenên kurtbûna jîyanê ne. Wê xwe ji vana xilas  
kiribû û jîyanek pak û dirêj diborand.

Paşê ew hatin; şev bû. Jonathan li asîmanê xwe yî  
xoşewîst bêfîkar dadiwerivî. Ew di wî awayî de dîtî.

Du qaqlîbaz, wek du stêrkên biriqî li serê pozê baskên  
qaqlîbaza Jonathan xuya bûn. Ronahîya tîrêjên kû ji bedena  
wan dibiriqîn di himbêza şevê de evînî û dostayî  
belav dikir.

Jonathan, ji bo pêşandeyek dijwar kû ji wê pêve tu  
kes nikare bike gazî wan kir. Baskên xwe bi badan vekir.  
Leza wê daketibû di seatekê de mîlekê. Mana vêya  
li hewa sekinandin bû. Her du çûkên biriqîn jî, bi wê  
re lez kêr kirin. Û bi ahengeke nerm bi hevdû re bûn  
yek. Wan jî firîna hêdî zanîbûn.

27

Paşê ew hatin. Ronahîya tîrêjên kûji bedena wan dihiriqîn  
di himbêza şevê de evînî û dnstayî belav dikir.

Baskên xwe pêça û teqlek avêt. Û bi leza di seatê  
de sed û nod mîlî de berjêr pîke kir. Her du qaqlîbazên  
din jî bi wê re ketin pîkê. Bi vî awayî li hewa sê qozîyek  
kû ji her qozîyê şopê li dû xwe dihêle pêk anîn.

Jonathan ji pîkê derhat. Bi wê lezê berjor tûj bilind bû  
û dest bi teqlên hêdî kir. Ewna jî bi mizancin tev li Jonathan

bûn.

Gava kû qaqlîbaza Jonathan vejerîya ser firîna sererast, demekê bêdeng rawesta. "Başe," got. Paşê, "De bêjin hûn kî nin?"

"Em birayên te nin Jonathan, birayên te." Ev gotinan hêdî, yeko yeko, bi hêz û pak hatibûn gotin. "Em hatine te bibin hêlîna jortirîn."

"Hêlîna çi? Helîna min nîne. Ê refê min jî nîne.

Ez nefî bûme. Hûn ji min re dibêjin emê bi hev re bi leza bayê çiyayê bilind bifirin. Ez vî laşê westîyayî bi van baskan nikarim sed mîtroyî kaşkim."

"Na Jonathan, tê bi kar bê. Te gelek qonax derbas kir. Dem, dema qonaxên nû ne."

Ev nêzîkbûn, di vê hengava balkêş de, hundirê Jonathan rohnî kir. Wan, ya rast digotin. Êdî dema zivirîna hêlînê hatibû. Dikarîbû bilind, hîn bilind bifirîya. Carek din awirên xwe yê paşin avêt asîmanê bêhempa; wî welatê rewnaq û zîvîn... Li wir çiqas pir hînî tiştan bûbû.

"Êdî, ez amademe." got.

Ê qaqlîbaza Jonathan, bi dû qaqlîbazên kû di tarîya şevê de wek du stêrkan diçûrise firîya çû. Ji ber çavan bi dûr ket, winda bû.

29

Carek din awirên xweyên paşin avêt asîmanê bêhempa; wî welatî rewnaq û zîvîn

BIRRE DUWEMIN

Di hundirê xwe de digot bihuşt ev dere. Ê di dilê xwe

de mizmizî. Ji bo yekî kû nû gihîştibû ber derîyê bihuştê, li ser têgihîştina nepenîya bihuştê mijûlbûn, ne şîrovekirinek kû bêye erîyandin bû.

Gava kû di nava du qaqlîbazên bi çirûsk de ji dinyayê hatibû, dîtibû kû bedena wê jî gihîştibû biriqandinek jandar. Di binê çavên wê yî bi çirûsk de, jîyana Jonathan Lîvîngston'a ciwan hebû. Guhertin bes di daxuyanê de bû.

Bedena wê dîsa bedena qaqlîbazekê bû. Belê aniha di firînê de ji berê gihîştîr bû. Digot bi nîvê xebata li dinyê, ya kû bi ber min fikir, êdî ezê leza xwe bigihînim du taqî.

Perên wê, çîl û pak bûn. Baskên wê, wek lewheyên zîvîn û bi cîle bûn. Bi şahîyek mezin dixebitî kû baskên xwe yên nû nasbike û ew bi hêza xwe ya dawîn diperpitand. Leza wê kû gihîşt du sed û pêncî û neh mîlî, seh kir kû ev lez ya dawîne. Gava kû gihîşt du sed û heftê û pênc mîlî, fikirî kû nema dikare bir ser vê lezê keve û xemgîn bû. Leza wê di ser reqora berê de bûya jî; tixûbekî, bedena wê nikare derbaske hebû. Ji bo derbaskirina vî tixûbî hêzek mezin pêwîst bû. Belê divêt kû li bihuştê tu tixûb tune be. Wisa mijûl dibû.

Ji nava ewran, dengê qaqlîbazên hevalên wê dihat: "Ji tere daketinên baş Jonathan!» digotin. Ê qaqlîbaz ji ber çavan winda dibûn.

33

Perên wê, çîl û pak bûn. Baskên wê, wek lewheyên zîvîn û bi cîle bûn.



Di ser bahrê de, ber bi rexeke bi zinar difirîya.  
Çend qaqlîbazan xwe bi ber bayê newalê berda bûn, ceribandînen  
firîne dikirin. Çend ji wan jî, ber bi asoyê  
bakur bi rê ketibûn. Vaye cîhên nû, mijûlên nû û pirsgerêkên  
nû... Çima qaqlîbaz ewqas hindikin? Divêt kû  
bihuşt, bi refên qaqlîbazan bikelîya. Ev westan çîye?  
Divêt kû qaqlîbazên bihuştê tu caran newestin û ranezên.  
Başê, lêbelê ev hemû tiştan ji ku bihîstibû? Jîyana  
wê ya dinyê gav bi gav ji bîra wê diçû. Li wir ewqas hînî  
tiştan bûbû kû, helbet wê tiştên biçûk bintoz bibûya  
û wê wînda bibûya. Belê nefîbûn, ji ref bidûrxistin, pevçûna  
qaqlîbazan ya ji bo xwarîne hêj di bîra wê de bû.  
Duzînek qaqlîbaz li rex bêpeyv hatin pêşwazîya wê.  
Qaqlîbaza Jonathan dizanîbû pêşwazîyek qenc pêşî wê  
kirine. Êdî hêlîna wê ev der bû. Rojek pir dirêj û guherte  
derbas kiribû. Rojek kû, hilatina rojê ji bîr kirin  
dabû.  
Ji bo xwe li peravê bahrê dîne, nizm bû û ji erdê bi  
du santîman berjor, baskên xwe çirpand û bi nermayî  
xwe berda ser qûmê. Qaqlîbazên din jî daketin. Belê  
wan, sînga xwe hêdîka dabûn ber bê, paşê baskên rewnaq  
velizandin û perên serê baskan badan û berî kû  
lingên wan bigihîjin erdê daketibûn. Ev çî daketînek  
xweş bû. Belê aniha Jonathan wisa westyayî bû kû, nikarî  
vaya biceribanda. Li ser qûmê weha bêdeng xew de  
çû.

35

Ji bo xwe liperavê bahrê dîne nizm bû.

Di rojên paşîyê de qaqlîbaza Jonathan fehm kir kû, tiştên di salên çûyî û windayî de hînî çî bûbe, wê li vir ji wana zêdetir bielime. Û hemî qaqlîbazên li vir jî wek wê difikirîn. Ji bo her yekê ji wan di jîyanê de tiştên herî girîng; derbaskirina xwe, têgihîştina firînê û firîn, firîn bû... Her roj bi seatan ceribandîna firînê dikirin. Qeydên teknîka xwe ya pêşxistî diceribandin. Vana giş teyrên rewnaq bûn.

Jonathan demek dirêj bêrîya dinya kû jê hatibû nekir. Ji ber kû ew dinya, dinya yê kû çavên xwe li ber dilgeşîya jîyanê girtî û yê kû baskên xwe bes ji bo bidestxistina xwarînê diçirpînîna bû. Bi firkeyî bûya jî, car caran ji bo demek kurt bûya jî ew dinya dihat bîra wê. Sibehekê bi fêrdarê xwe re ceribandîna firînê kiribû. Xebata bi baskên girêdayî avêtina teqlan xilas kiribû, li peravê bahrê li ser qûmê radiwestîya. Bi carekê jîyana wê ya dinyê ket bîrê.

Ne bi qîjewîj û ne bi xwendina bê mane, bi zimanê bêdengîyê pirsî: "Yên din li ku ne Sullîvan? Çima şênîya me nîne? Çiqas xerîbe! cîhê kû ez jê hatibûm..."

"Li wê derê bi hezaran qaqlîbaz dijîyan, ez zanim.

» got Sullîvan. Û serê xwe hejand.

"Ez dikarim yek bersîvê bidim te. Tu di nava bi milyonan qaqlîbaz de yeka bijarte ye. Piranîya me bi hezaran dijwarîyên mezin gihîştine vir. Em ji dinyakê derbasî dinyake din kû dişibihe dinya me bûn. Tew di ser de me hay jê nîne kû em ji ku hatine û em li ku ne. Û em rojane jîyan. Ji ziktêrkirinê, ji pevçûnê û di nava

ref de daxuyana xurtîyê hêjatirên girîng hebûn. Ji bo gihîştina vê bîrê, gelo em di çend jîyanan de derbasbûn?

Bi hezaran Jon, bi hezaran!... Û paşê, ji bo sehkirina gihîştinê belkî em di yek, belkî jî di sed dinyan de derbas bûn. Û di ewqas dinyên din de jî em hînî gihîştîbûnê bûn kû ew armanca jîyanê bû. Ev qeydenan êdî ji bo me jî di cîh de ne. Bi alîkarîya tiştên kû em li vê dinyê elîmîne, emê dikaribin pêşhatîya xwe jî damezirînin. Kû em neelimin tişteki, wê dinya me ya pêş, wek ya niha be. Jîyanek monoton, jîyanek bitixûb û hertim di cîh de; berpîrsîyarek bêmane, û di giranîya gullê de... hertim wekhev."

Sullîvan baskên xwe şidand û bi ber bê fitilî.

"Belê tu Jon, tu vana hemîyan bi carekê elimî. Ji bo kû tu were vî cîhî, hewceyî kû tu di hezar dinyan de derbasbe nekir.»

Piştî demek hindik, herduwa ji nû ve dest bi ceribandîna firînê kirin. Tetbîqa teqla ducare û bervaja pir çetin bû. Divêt kû Jonathan, di nîve teqlê de serberjêr mijûl bibe û baskên xwe bi fitilokê şûnde vegeirîne û bi fêrdarê xwe re ahengê bigre.

Sullîvan got: "Divê ez ji nû ve biceribînim."

"Ji nû ve... vaye bû... rinde!" Paşê dest bi teqlên berderve kirin.

Şevêkê, qaqlîbazên kû derneketibûn firînê, li sêlxanê gumlat bûbûn, difikirîn. Dihat gotin kû wê qaqlîbaza di nava wan de ya herî pîr, di demek nêzîk de ji

vê dinyê koç bike. Jonathan culhet da xwe û nêzîkî qaqlîbaza pîr bû:

38

Bi dengekî xemgînî got. "Chiang..."

Qaqlîbaza pîr bi çavên evînî li wê nihêrî û bersîv da got: "Belê kurê min..." salên çûyî ji bedena wê xwaribû belê ne bêtaqet bû; heta dikarî ji qaqlîbazên din dûrtir bifirîya kû tu kes xwe nagihînê. Dikarî jêhatîyên kû tu kesî nizanî bû bikira.

"Chiang, ev der ne bihuşte, ne wisa?"

Di hîvronê de li ser rûyê qaqlîbaza pîr ken belav bû. Ê got. "Qaqlîbaza Jonathan, tu disa li dû hînbûnê ye."

"Başe, belê, wê ji îro pê ve çi bibe? Em bi ku de diçin? Ma qey bihuşt tunne?"

"Na Jonathan, cîhekî wilo nîne. Bihuşt ne cîh e û ne jî dem e. Bihuşt gihiştîbûn bi xwe ye." Bêdengîyek kurt çê bû. Qaqlîbaza pîr jê pirsî. "Tu firokek pir bi leze, ne wilo?"

"Ez... ez... ez zehf ji lezê hezdikim." got, Jonathan.

Piçekî fehdî kiribû. Belê pêzanîya qaqlîbaza pîr bi wê gelek xweş hatibû û fêz dabû wê.

"Jonathan, gava kû tu gihişt leza gihiştî yê, bihesibîne kû te derîyê bihuştê vekirîye. Ê ev ne seatê de hezar mîl, ne milyon mîl û ne jî firîna bi leza ronahîyê ye. Ji ber kû hejmar bi tixûbin. Kurê min, bes bi leza gihiştîyê mirov dikare li wir be."

Chiang ji nişka ve ji ber çavan winda bû û hema

deh panzdeh mîtroÿî wê de li qeraxê avê xuya bû. Evna hemî bi carekê pêk hatibûn. Dîsa winda bû, îcar li ser milê Jonathan xuya bû û got. "Iyîstikek xweşe ne?"

39

Chiang qaqlîbaza ciwan bi çavbal dawerivand û got

"Ji bokûtu bixwaze bi leza gihîstî bighê derekê, divê kû tuji aniha ve bawer bike kû tê bigihêjê."

Jonathan wisa şaş mabû kû pirsên xwe yên li ser bihuştê ji bîr kir. "Tu vêya bi çi awayî dike? Ev hisek çawa ye? tu dikarî çiqas dûrtir herî?"

Qaqlîbaza pîr lê vegerand. "Mirov bixwaze dikare here her cîh û her demê" got. "Ez çûme her cîh û her perçê demê." "Û li bahrê wê de, li berbangê nihêrî." Çiqas xerîbe! Qaqlîbazên leza gihîstî biçûk dibînin nagihêjin tu derê. Û yên ji bo leza gihîstî hebûna xwe hemî didin holê, dikarin herin her derê. U him jî kîja demê bixwazin, wê demê. Bîne bîra xwe Jonathan, bihuşt ne cîh û ne demek e. Ji ber kû cîh jî, dem jî tenê averûne, bêwate ne. Bihuşt..."

Qaqlîbaza Jonathan, ji bo hînî tiştên din yên nenas bibe bi heyecan pirsî: "Tê firîna wilo fêrî min jî bike?"

"Belê, kû tu hînbûnê bixwaze."

"Dixwazim, em dikarin çi çax dest pê bikin?"

"Aniha, vê gavê. Tu çi dibêjî?"

Di çavên Jonathan de ronahîyek xerîb çûrisî.

"Dixwazim hînî firandina weha bibim. Bêje, divê ez çi bikim"

Chiang, qaqlîbaza ciwan bi çavbal dawerivand û giran

giran peyivî. "ji bo kû tu bixwaze tu bi leza gihîştî  
bighê derekê, dive kû tu ji aniha ve bawer bike kû tê bigihêjê"  
Li gor Chiang, yek rêgeza vî karî hebû. Divêt kû  
xwe bi çavê qaqlîbazek kû xwedî rêgeha bi tixûb û xwedî  
qasî mîtrok bask nebîne.

Rêgeza vî karî; têgihîştina bîra jîyanek gihîştî ya bênav  
ya hebûna xwe bi xwe ye. Di gerdûnê de, li her cîh  
û li derî demê.

41

"Jonathan! gava kû tu gihîst leza gihîstîyê,  
bihesibîne kû te derîyê bihustê vekûiye."

Jonathan bi rojan, ji rojhilat heta nîvê şevê bi bawerî  
û bi xwastinek mezin xwe da xebatê. Teva vê hewldanê  
jî bi qasî dirêjahîya baskekî pêşve neçû.

Chiang digot. "Divê tu bawerîyên xwezayî ji bîr bike."  
Û didomand. "Ji bo firînê, ji te re bawerîya xwezayîyê  
navê. Hew firînê fehm bike, bese. De, aniha carek  
din jî biceribîne..."

Jonathan ji rojan di rojek paşîn de, li delav çavgirtî  
bû ketibû mijûlîyên kûr. Û ji nişka ve seh kir kû Chiang  
xwestîye çî bibêje. "Gotinên wê rast bûn. Ez qaqlîbazek  
bêtixûb û gihîştî me." Bi şahîyek mezin ji xwe  
derbas bû.

Bi dengê serketin Chiang got. "Rinde!"

Jonathan çavên xwe vekir û xwe bi qaqlîbaza pîr re  
li ber perê bahrek nenas dît. Li wê derê dar, heta ber  
qeraxê avê belav bûbûn. Û li ser wan rojên zer û zirav  
digerîyan.

Chiang got: "Ya dawîyê vaye tu elimî" lêbelê ji bo tu bikaribe xwe qontrol bike, divê tu hinek din jî bixebite."

Jonathan şaş û şaş pirsî: "Em li ku ne?"

Qaqlîbaza pîr di bin bandûra vî cîh û warê biyanî de nemabû. Bersîv da: "Bê şik em li stêrkek din in.

Stêrkek kû xwedi asîmanê kesk û li şûna rojê xwedî du stêrk..."

Jonathan bi dengê kevîrên biçûk yên kû ji newalekê gêr dibe got: "BÎSERKETIM!» Piştî ji dinyê veqetîyabû ev dengê wê yî yekemin bû.

Chiang: "Helbet tu biserket Jon." got:

43

Li wê derê dar, heta ber qeraxê avê belav bûbûn.

U li ser wan rojhn zer û zirav digerîyan.

"Gava kû tu bizanibe tê çî bixwaze, tê biserkeve.

Êdî dora bi kar anîna tiştên te bi dest xistîye..."

Şûnde veqerandinê de, ji mêj tarî ketibû erdê. Qaqlîbazên

din, bi çavekî evînî û heyranî pêşwazîya Jonathan

kirin. Ji ber kû wan dîtibûn ew, ji dinya xwe ya ji

mêj ve reh lê berdayî veqetîyabû. Piştî demek kurt, qaqlîbazan

hemîyan Jonathan pîroz kirin. "Ez di nava we

de pir nû me." got Jonathan. "Ez nû dest bi her tiştî dikim.

Ezê ji we hîn bibim. Sullîvan ya li kêleka Jonathan

got "Ez ji vêya bi şikim. Ev panzdeh sale di nava

qaqlîbazên kû ez dinasim bes tu bê tirs xwe nêzî hînbûnê

dike." Koma qaqlîbazan wextekê bêdeng man. Jonathan

ji pesndarîyê fehdî kiribû.

Chiang got: "Heke tu bixwaze , em dikarin dest bi

ceribandinên firînên kû tu pê bigihîje dema mêj û dema pêş. Wê çaxê tê amadeyî gîhandina mana başî, xurtî, rindî û evînîyê bibe."

Mehek an jî nêzî mehekê dem derbas bûbû. Jonathan bi lez û bezek tirsehêz hîn dibû. Elimandinên wê yên bertir bi ceribandinên rojane bû. Vêga bi xwendevantîya qaqlîbaza pisor, te digot qey fikrên nû di hundirê qompîtûrek bi peran nuxumandî depo dike.

Belê Chiang, ji rojan rojekê ji ber çavan winda bûbû. Berî veqetinê şîret li şagirtên li dora wan civîyabûn kiribû. Ji wan heryekî re qala; hînbûnê, ji dev negerîna tetbîqa tiştên kû elimîne, bi sebr û înad xebata fehmkirina gihîştîbûna jîyana nexuyayî. Bi girîngî li ser ev tiştan sekinî bû.

45

Gava kûji nû ve /ê nihêrîn, êdî Chiang tune bû  
Bi axaftinê re perên wê biriqî bû, paşê ewqas biriqî  
bû kû, tu qaqlîbazan nema dikarî li wê binêrîya.  
Gotina wê ya paşîn ev bû. "Jonathan xebata xwe ya  
li ser evînê bidomîne!"

Gava kû ji nû ve lê nihêrin, êdî Chiang tune bû.  
Bi derbasbûna rojan, Jonathan li ser demê mijûl dibû,  
her gav dinya kû ew jê hatibû diket bîrê. Li dinya  
wê, zanebûna wê qasî ji dehan yeka aniha bûya, heta ji  
sedî yek bûya, wê mana jîyanê çî qas bilind biba. Ji xwe  
re difikirî û digot; gelo, tu qaqlîbazên kû li ser şikandina  
çembera kû hebûna wan kirîye nav sînor dixebite hene  
û tu qaqlîbazên ne ji bo kurtîlên nanên ji keştîyan



têne avêtin, ji bo maneya firandinê ya bi rastî digerin hene? Dibe kû ji xêndî wê qaqlîbazek din jî wek wê rastî li rûyê ref xistibe û hatibe qewirandin, nefa bûbe. Li sêlxanê radiwestîya û ev fikirnan di hişê wê dê derbas dibû. Zanebûna wê ya li ser çêbûna evînîyê û rindîyê pirtir dibû. Di dilê Jonathan de xwestina şûnde-vegerîna dinyê wek şapê mezin dibû. Li himber jîyanek di nava tenêbûnê de derbas bûyî jî, wê evînî di jîyanê de naskiribû. Wê eva incax dikarî pêşî qaqlîbazek kû, ji xwe re şansekê dixwaze bikira.

Sullîvan xemgîn bû. Sullîvana kû hînî firîna bi leza mijûlîyê bûye û imkanên vê zanebûna xwe rê kesên din bide bi dest xistî bû.

47

"Jon, carekê tu nefa bûbû. Tu çawa difikire kû ji ref tu qaqlîbaz wê guh bidin şorên te? Tu dizane ev diwêj her tim di cîh de ye. "Qaqlîbaza herî bilind difire, ya kû dûrtir dibîne ye." Qhê kû tu jê hatîye, Li wir qaqlîbaz dîkin qîştîn û bi hev re şerdîkin li peravê bahrê dilûsin. Ew bi hezaran mîl ji bihuştê dûrin û tu dixwaze ji vir bihuştê pêşî wan bike. Ew serê baskên xwe nabînin Jon! Li vir bimîne û alîkarîya qaqlîbazên ji fêr kirina te fehm dîkin bike." Piştî bêdengîya kurtedemekê Sullîvan peyva xwe wisa domand.

"Chiang wek kû tu difikire zivirî bûya dinya xwe, wê çawa bûya? îro tu wê li ku bûya?"

Sullivan rast digot. Van şoran rastîya vekirî dianîn berçavan. Qaqlîbaza dûr dibîne, ya bilind difire ye.

Jonathan, veneqetîya. Bi qaqlîbazên nû yên jêhatî,  
jîr û zîrek re xebitî. Dîsa jî dilînên wê zû zû jandar dibû.  
Ji fikrên li dinyê hebûna du-sê qaqlîbazên motajî  
wê hene xwe xilas nedikir. Gava kû li nefîyê bû rastî  
Chiang bihata, wê ji aniha ne zanetir bûya.  
Rojekê ji hevalê xwe re got, "Sully, divê ez şûnde  
vegerim. Şagirtên min rind gihîştin. Ji bo yên nû werin,  
dikarin alîkarîya te bikin."

Sullîvan bêhnteng bû, berketîbû. Belê gengeşî nekir.  
Bes got: "Jonathan, emê zehf bêrîya te bikin."

Jonathan bi gazine got. "Fehdî bike Sully, radana bêhi  
şan neke. Wek kû tiştên em elimînê te ji bîr kirîye.  
Hevaltîya me bi dem û dûrbûnê hatibe tixûbkirin wê  
çaxê hevaltîya me nîne.

48

Qaqlîbaza herî bilind difire, ya kû dûriir dibîne'ye  
Ji yalî demê û dûrbûnê em di jîyanek bêtixûb de  
ne. Kû em dikaribin dûrbûnê bi bin xin emê di yek cîhî  
de bin, kû me dem bi bin xist, emê di yek demê de  
bin. Tu bi vî awayî nafikire kû emê her dem li ba hev  
bin.

Qaqlîbaza Sullîvan bi zorê kenîya, bi dengekî evînî,  
"Tu çûka dînî " got. "Heke yek hebe kû yên erde, hînî  
dîtina hezar mîl dûr bike ew jî tu ye Jonathan" got.  
Paşê çavên xwe ziq berda qûmê û got, "Bi xatirê te,  
dostê min Jon."

"Bi xatirê te Sully! Emê dîsa rastî hevdû werin."

Wê gavê, ket xewna dîtina refekî qaqlîbazan yê mezin

li deravê û di demek din de. Ew di jîyana xwe de hîn bûbû kû, bedena wê ne tenê per û hestîye. Ew rumûz a gihîştî ya azadîyê û firîna bêtixûbe.

Qaqlîbaza Fletcher Lynd, hêj zehf ciwan bû. Dizanî bû ji yalî tu refan û tu caran ewqas neheqî, xirabî û bêdadî li tu çûkan nehatîye kirin.

Ber bi zinarên dûr ve difirîya û bi qehr fikirî. "Tiştên wê gotîye tew ne xema mine." çavên wê tijî bûbû.

"Firîn ne ji cîhekî heta cîhekî din perpitandina baskan e, ew bûyerek hîn zêde bi mane ye. Kelmêş jî bi tenê baskan li hevdû dixin û difirin. Yek li pêş serdarê qeflên qaqlîbazan teqleke biçûk bavêje, di cîh de nefî dikin! Ma qey vana korin? Ma mezinahîya maneya rastîya firînê nabînin?"

"Fikrên wan ne xema mine! Firîn çawa dibe ezê pêşî wan bikim! Kû dixwazin, ezê ji binî de derkevim derî qanûnê. Ê ezê wan poşman bikim!.."

50

Bi carekê di hundirê serê xwe de dengêk bihîst.

Dengêkî nerm bû, belê qasî kû wê li hewa bihejîne tirsand.

"Li himber wan ewqas hişk nebe qaqlîbaza Fletcher.

Bi qewirandina te, wan bes xisar dane xwe. Wê rojek bê, tiştên kû tu dibîne wê ew jî bibînin. Li wan bibore û alîkarîya wan bike kû ew jî, rastîyê fehm bikin."

Du-sê santîman dûrî baskên wê qaqlîbazek çîl sipî û rewnaq difirîya kû di dinyê de hevalê wê tune bû.

Him jî bi leza Fletcher ya dawîyê û yek perê wê jî nedilivîya.

Çûka ciwan, bi carekê xwe di nava demek kaosê de

dît. "Çi dibe? Ev çîye? Ma gelo ez hişê xwe winda dikim?"

Dengê di hundirê serê wê de got: "Qaqlîbaza

Fletcher Lynd, ma tu dixwaze bifire?"

"BELÊ, DÎXWAZIM BIFÎRIM!"

"Qaqlîbaza Fletcher Lynd, ji bo rojekê vegere nava refê xwe, ji bo hînbûnê alîkarîya wan bike û li wan bibore, tu dixwaze bifire?"

Fikirî û ji xwe re got; Bila ez çiqas bi fêz bim û çiqas

dilşikestî bim jî, ez nikarim derewan li vê mexlûqa

gihîştî bikim. Ê hêdî bersîv da, got: "Belê"

Mexlûqa Rewnaq bi dengê evînî got. "Naxwe

emê berê ji firîna dûz destpêbikin."

51

A, A. BIRRE SEYEMIN

Jonathan li ser zinarên dûr, li der û dora xwe çavnêrîn dikîr û bi giranî xêzên glover pêk dianî. Fletcher, dişibihî şagirtekî bijarte kû li ser nehatîye xebitandin. Ya girîng, bi dilxwazîya hînbûnê ve tijî bû. Hewa jî wek gullê giran û bi hêz bû.

Waye qaqlîbaza Fletcher, wek şiklekî gewr û şêlo bi gurmîn pîke dikir û dihat. Bi leza di seatekê de sed û pêncî mîlî di kêleka fêrdarê xwe de bi leza gullê derbas bû. Divêt kû li pêş, heta hejmartina şanzdehan derbasî teqlên hêdî û dîk bibe.

"... Heyşt. neh... deh...binêre Jonathan vaye lezê kêr dikim... yanzdeh... Dixwazim nola te di cîh de bisekinim... duwazde... nalet li şeytên bê, nebû...sêzdêh... ev sê hejmarên paşin tune? bê wan... çard... aaxxx'..."

Neserketina Fletcher ya li hewa, kerba hundirê wê zêdetir kiribû. Bi lez serpişkî dadiket; ji nişka ve teqlek avêt û bi hêz bervaja bû. Di dawîyê de, bî sîh mîtroiyê jêrî fêrdarê xwe, xwe stend bin qontrolê.

"Jonathan ez bêhişekim! Bi hewldanê, bi xebatê vaye dîsa bisernakevim. Tu wexta xwe bêsebeb bi min re winda dike..."

Qaqlîbaza Jonathan wek bêje na! serê xwe hejand.

"Fletcher, tu wisa hişk dest pê bike, ne ji xwe tu bi sernakeve.

Di destpêkê de te çil mîl lez winda kir. Divê tu nermtir be. Bi biryar, belê nerm."

Daket cem qaqlîbaza ciwan." Vêga em li ba hev bi hevdû re biceribîn. Divê tu nerm û xwezayî destpêkê"

Di dawîya meha sisêyan de, şeş şagirtên Jonathan yên nû çêbûn. Hemû jî, ji ref hatibûn qewirandin.

55

Hemû li pey fikra firînê bûn. Ev bi wan nû dihat. Belê hemû di nava şabûna firînê de bûn. Wanê dawîyê maneya firînê ya bi rastî fehm bikirina.

Jonathan ser êvarê ew li sêlxanê dicivandin." Di eslê xwe de em her yek perçek ji qaqlîbaza bilindtirin. Firîna hosteyî jî, xwebûna me tîne zimên. Emê ji tiştên kû me dike nava sînoran xwe bi dûr xînin. Armanca leza bilind, leza nizm û ji bo firîna aqrobasîyê..." got... Û şagirtên wê di dawîya firînên rojane de, di guhdarîkirina wê de ji bêmecalî xew de diçûn. Belê ji vê xebatê hez dikirin. Ji ber kû di wê de; lez û heyecan, bidom tiştên birçîbûna fêrbûnê têr dikir hebû. Ne qaqlîbaza

Fletcher û ne jî tu wê din armanca firînê wek dîtina bê  
û dîtina peran eşkere fehm nekiribûn...

Qaqlîbaza Jonathan rojekê ji wan re got: "Hûn mijûlîyên  
xwe wek bedenek kû ji serê perê baskan, heta  
serê neynûkan hatîye tixûbkirin dibînin. "Belê zincîrên  
kû fikrên we girêdayî biqetînin, wê çaxê hûnê bibîn  
kû bedena we jî gîhaye azadîyê." Ew çiqas bipeyîve bila  
bipeyîve ev gotinan ji qaqlîbazên ciwan re wek çîrokan  
dihat û hêdî hêdî xewa giran digirt ser wan.

Piştî mehek din, qaqlîbaza Jonathan ji wan re got,  
wexta vegera nava ref hatîye û derbas bûye.

Qaqlîbaza Henry Calvin bersîv da, got. "Em hêj ne  
amadene, em ji wî refî hatine qewirandin. Em êdî çûkên  
dervayî civatê ne. Qhekî kû em lê nayêne xwestin,  
em zorê nadin xwe kû em lê vegezin."

56

Qaqlîbaza Jonathan lê vegezan: "Em qaqlîbazin  
wilo azadin kû, em bixwazin li ku bimînin û em biçin  
ku, em bi kêfa xwe nin." got. Ê ji ser qûmê rabû ber bi  
rojhat, ber bi erdên kû ref lê ne, dest bi firînê kir.  
Qaqlîbazek kû ji ref hatîye qewirandin nikarîbû tu  
caran li ref vegeza. Ev qanûnek bû û ev deh hezar sale  
ev peyman nehatibû xerabkirin. Şagirtan ji vê fikrê  
ditirsîyan. Fermana qanûnê neçûyîn bû, mayin bû. Jonathan  
jî digot Herin! Tew di ser de ew bi rê ketibû jî.

Kû ew zêde dereng bimana, Jonathan wê tena serê xwe  
bigihîşt nava refê kû bi wê re bûne dijmin. Fletcher fitilî  
ser hevalên xwe û bi dengê xemgîn: "Çima emê

guhdarîya qanûnên refekî em ne ji wanin bikin." got.

"Heke emê şerekî bikin dive em li cem Jonathan bin. Wê çaxê emê ji vir bêtir bi kar bîn."

Bi vî awayî, wê sibehê heyşt qaqlîbaz bi hevdû re, ji rojava dest bi firînê kirin. Çarhebo rêz bûbûn, du cot pêk anîbûn. Te digot qey dike serê baskên wan bi hevdû bibe. Li pêşîyê Jonathan, Li pozê baskê rastê Fletcher a hêsanî difire, li çepê Henry Calwîn bi hewldanek mezin aheng digirt... Koma heyşte bi firîna leza sed û pêncî mîlî gihîştin deravê kû ref lê bi cîh bûye. Bi afirandina çarqozîyan xwe berê hêdi bi ser milê rastê dan. Her serîyek bilind bû bervaja zivirîn... bilind bûn.

57

Qaqlîbaza Jonathan got "Em qaqlîbazin wilo azadin kû, em bixwazin li ku bimînin û em biçin ku, em bi kêfa xwe nin." Û vê koma rewnaq, jîyana rojane yê refên qaqlîbazan yê giregir û bi qîjewîj wek kêrek girs ji asîman dakeve birrî. Heyşt hezar qaqlîbaz bêçavgirtin li wan mêze dikirin.

Her heyşt jî, yek bi yek, bi teqle avêtin daketin derava di bédengîya mirinê de. Qaqlîbaza Jonathan, wek di xebata rojane de be, dest bi rexnê firînê kir.

Bi dengekî bêkêf kenîya û got. "Ez berê vêya bêjim kû, hûn di yekbûnîyê de qasekî dereng man." Ref, li himber yên kû nû hatibûn, sar cemidîn. Ev çûkna hatîbûn qewirandin. Çawa dibe, biculhet şûnde vedigerin.

Ev ne îşekî kû bibe. Bi şaşbûna ref, şerê kû Fletcher difikirî bi cîh nehat.

Çend qaqlîbazan şîrove kirin û "Bê şik dibe kû ew hatibin qewirandin, belê..." gotin. Ê zivirîn ser her heştên nû hatibûn û pirsîn. "Hela bêjin hûn li ku hînê firîna wilo bûn?"

Fermana serdar di nava seatekê de li nava qaqlîbazan belav bû. "Bila kes guh nede wan! Her kî bi qaqlîbazek nefî bûye biaxife, bila bizanibin kû ewê jî bêne qewirandin. Yê kû serê xwe bizivirîne û li wan binêre, wê bêye hesabandin kû wan jî qanûn peyman kirîye!" Ji wê demê şûnde ref tevan, berê xwe ji qaqlîbazên nefî guhertin. Belê Jonathan xwe li nedîtîne danî û xebata xwe ya li "Sêlxana komcivîne" domand. Heta sînorê paşin zor dida gihiştîya şagirtan.

59

Wê sibehê heşt qaqlîhaz bi hevdû re, ji rojava dest bifirîne Mrin.

Bi dengekî asîman pê biheje, "Qaqlîbaza Martîn!" got. "Tu qala zanebûna leza nizm dike. Heta kû tu vêya ji me re îspat neke, zanebûna te nayê hesabandin.

De, pêşî me bike, em bibînin! BÎFiRE!..»

Wisa dixuya kû, qaqlîbaza biçûk Martin William, ketibû bin bandûra gotinên mamosteyê xwe. Qasî kû ew jî li xwe şaş bimîne bi hosteyî firîna leza nizm kir. Baskên xwe li ber bayê sivik hêdî vekir. Ji sêlxanê heta ewran bi bêliva baskan bilind bû... û daket.

Qaqlîbaza Charles Roland ji bayên zinarên mezin hêz stend û firîya heft hezar û du sed mîtroyî. Di daketina jêr de, ji "dewsandina ketî" û ji germê, rengê wê



mohr bûbû. Belê, pir şabûyî bû. Bi biryar bû kû wê roja din bilindtir bifire.

Qaqlîbaza Fletcher ji dil pêgirtîyê aqrobasîya hewa bû. Ber bi pêş heta şanzdehan hejmart û firîna xwe ya dîk ya bi badana hêdî, bi serkevtin qedand. Roja din bi firîna sê çixîzê, firîna xwe xemiland. Û tîrêjên sipî yê kû rojê li ser baskên wê pêde kiribû, biriqand ser qaqlîbazên li sêlxanê kû bi çavên daxwaz temaşa wê dikirin.

Jonathan her gav li ba şagirtên xwe bû. Bir zordanê, bi li berxistina rê û bi berîdanê ew dielimandin.

Qaqlîbazên sêlxanê bêguhderî dicivîyan û disekinîn.

Ew bi şagirtên xwe re bi hewa diketin û di himbêza şevê de, di nava ewran de, baran bahozê de difirîyan. Ev firînen wilo bi wan wek sporê dihat.

61

Her heystjî, yek biyek,

bi teqle avêtin daketin derava di bédengîya mirinê de Piştî firîne şagirt, li sêlxanê kom dibûn û ji dil guhdarîya Jonathan dikirin. Li ba fikrên xerîb yên kû ténagihîjin, fikrên kû fehm dikirin jî hebûn.

Bi wextê re, li nêzî komika şagirtên li dor Jonathan, komikek qaqlîbazên din jî xuya bûn. Vana di reşayîya şevê de bi seatan guhdarîya peyvan dikirin û dema rojhilat, bazdidan diçûn. Ne dixwestin kes çav li wan keve.

Piştî vegera wan bi mehekê bû. Bi navê Terrence Lowell qaqlîbazek, bi ûştî nenasîna qedexan hate lanetkirin û ji ref nefî bû, hate qewirandin. Bi vî awayî ew,

bû şagirta Jonathan ya heyşta.

Şeva din, qaqlîbaza Kirk Maynard jî, ji ref qetîya bû. Li ser qûmê dişewişî, baskê çepê li dû xwe kaş dikir û hat li ber lingê Jonathan hilşîya erdê.

Bi dengekî yekî kû li ber mirinê be, û bi berger got. "Alîkarîya min bike! Li vê dinyê ez ji her tiştî pirtir daxwaza firînê dikim."

"Naxwe, teva min bibe." got. Jonathan. "Ji erdê xwe biqete û em aniha destpê bikin."

"Lêbelê tu fehm nake... Baskên min... nikarim baskê xwe bilivînim."

"Qaqlîbaza Maynard, tu xwedîyê azadîya xwebûnê ye. Tu kes nikare vêya ji destê te bistîne. Ev qanûna qaqlîbaza mezintire."

"Tu dixwaze, dikarîbûna firîna min bibêje?"

"Dibêjim tu azade."

63

Ew bi şagirtên xwe re bi hewa diketin û di himbêza sevê de, di nava ewran de baran û bahozê de difirîyan.

Qaqlîbaza Kirk Maynard, baskên xwe wisa bi hêsanî û zû vekir kû, dawerivî himbêza şevê, wînda bû.

Ref, bi qîjînîya şahîya wê ya bilindayîya sed û heyş-tê mîtro yî hişyar bû.

"Dikarim bifirim! Binhêrin! DÎKARÎM BiFiRîM!..."

Berbangê, li derî çembera şagirtan nêzîka hezar çûkî bi çavên meraqî li Maynard mêze dikirin. Edî ji yalî kesî dîtin û nedîtin ne girîng bû. Hemûyan guhên xwe dabûn Jonathan, dixwestin gotinên wê fehm bikin.

Jonathan qala tiştên pir basît dikir. "Ji qaqlîbazekê re firîn mafekî xweza ye. Azadî jî, perçekî hebûnê ye. Adet û bawerîyên vala û çî tiştên kû azadîyê kêr dikin, divê mirov rahêjê û bavêje."

Dengek ji nava geremolê: "Ev tiştê kû azadîyê kêr dike, qanûna ref bi xwe be jî... emê rahêjin wê jî û bavêjin?"

Jonathan bersîv da; "yek qanûna rast heye, ew jî qanûna kû azadîyê pêk tîne, tu qanûnên din nînin."

Ji geremolê dengekî din bilind bû. "Tu çawa ji me dipê kû em wek te bifirin. Tu çûkek bijarte ye. Tu bi jêhatîyên taybetî, bi hêzên miqeddes hatîye xemilandin.

Tu taq bi taq ji çûkên din bilindtîre"

"Li Fletcher binhêrin! Lowell! Charles Roland!

Judy Lee! Ma vana jî çûkên bijarte û cîhê nin? Ne ji min û ne jî ji we tiştê wan yê zêdetir tune. Bes yek cihêtiya wan heye, ew bi xwe hesîyan, têgihîştin kû ew bi xwe çine. Ê dest bi jîyana vêya kirin."

65

Ji xêncî Fletcher şagirtan tevan, gotin çawa bû kû heta aniha me ev cûdatîya ne dît. Ji ber hişyarbûna dereng, bi tengezarî di cîh de livîyan.

Geremol roj bi roj mezin dibû. Hinek ji wan; ji bo hînbûnê, hinek ji bo mezintirkinê, hinek jî, ji bo biçûkkirina yê dixebite tev li wan dibûn.

Fletcher, rojekê piştî xebata leza bilind, ji Jonathan re wisa got: "Di nava ref de ji bo te tê gotin kû, heke ew ne lawê qaqlîbaza mezintir be; ew qaqlîbazek kû bi hezar salî pêşde dijî ye."

Keserek hat Jonathan û got: "Vaye, dawîya çewt fehm kirinê. Yan ji tere dibêjin xwedê ye, yan jî şeytan. Fletcher tu çi difikire? Ma bi rastî em di pêşîya demê de ne?"

Piştî bêdengîyek dûdirêj Fletcher bersîv da. "Ev firîn, ji yên kû dixwestin kişfa bi vî teherî firînê bikin, her tim hebûn. Tu têkilî ya wê bi pêşketîbûna demê re tune ye. Dibe kû em derî adetê bin. Bi gelemperî em ji gelek qaqlîbazan pêşdetir difirin."

"Ev jî fikreke" got Jonathan. Kurtedemekê serberjêr dawerivî bû û digot: "Ev fikra ne qasî fikra kû em derî demê dijîn xirabe."

Piştî heftekê bûyerek pêk hat. Fletcher ji komek şagirtên nû re qala rêgeza firîna leza bilind dikir.

66

Qaqlîbaza Fletcher bi leza stêrka rijyar, di du hezar û pencî mîtroyî de tûjpîke kir.

Bi leza stêrka rijyar, di du hezar û pêncî mîtroyî de tûj pîke kir. Ji sêlxanê bi deh santîman li jor bû kû wê ji pîkê derketa, qaqlîbazek biçûk hate himberî wê û ji tirsê bi qîrîn got "Dayêêê!" Qaqlîbaza Fletcher, ji bo kû li çêlê nekeve di demek kurt de, qasî ji dehan yekê sanîyê de li ser milê çepê zivirînek hişk kir. U bi leza di seatê de du sed mîlî ber bi zinaran, zinarên sirf ristim ve çû....

Te digot qey zinar, ji bo wê derîyekî mesmezin kû vedibe dinyak herî cûda bû. Hawirdorê wê tirsê, vekêşanê û reşayîyê girtibû. Ê pê re ber bi asîmanekî pir

ecêb û bîyanî ve kaş bû. Bi poşmanî, tirsokî, xemgînî,  
bi ji bîrkin, bi bîranîn û pir poşman...

Bi carekê dengê bihîst, dengê kû lihevraştatina  
Jonathan Livingston bi bîr dianî.

"Fletcher yek rêgeza me heye. Ew jî, bindekirina  
tiştên kû me tixûbî dike ye. Bi sebr, bi dorê û bi xebatê.  
Berî kû em bighên bernameyên pêşve, em nikarin  
di nava zinaran de bifirin."

"Jonathan..."

Jonathan hêdî bersîv da. "Yan jî kurrê qaqlîbaza mezintir..."

"Çi şuxlên te li vir heye? Zinar... ez... ma ez ne mirî...  
bûm?"

"De, canê Fletch. Bifikire. Li gor kû tu bi min re  
diaxife mana xwe tu ne mirîye. Li ser bûyera kû tu jîyaye  
tûldanek di bîra te de pêk hat. Ji vir û wê de biryar  
ya te ye. Di vê qonaxê de kû tu bixwaze tu dikare bimîne  
û hîn bibe Ji ber kû ev der, ji cîhê kû te li şûn hiştîye  
pir pêşdetire. Na kû tu bixwaze, tu dikare vegere nava  
ref û xebata xwe bi wana re bidomîne.

68

"Fletcher! Yek rêgeza me heye. Ewjî, bindekirina tiştên me  
tixûbî dikeye. Bi sebr, bi dorê û bi xebatê."  
te bi vê bûyerê ew gelek kêfxweş kirin.

"Dixwazim vegerim nava ref. Min bi şagirtên xwe  
re nû dest bi xebatê kiribû."

"Pir başe, Fletcher. Ji bîr neke kû, bedena te ne tiştêkî  
ji fikra te cîhê ye."

Fletcher serê xwe hejand û baskên xwe vekêşand;

Gava çavên xwe vekir, xwe di nava refê kû di nava zinaran de kombûyî dît. Bi gav avêtinê re, qîjîni bi ref ket.

"Dijî! Ya kû mirî bû, dijî!"

"Kurrê qaqlîbaza mezintir bi mistdana serê baskan (ew mist daye û) can daye wê!"

"Na! Ew vêya li xwe danîne! Ew şeytaneke! ŞEYTAN! Hatîye ref belav bike!"

Qîjîna "ŞEYTAN!" di nava refê qaqlîbazan de nola bayê bahoz pêl da. Geremola çar hezar qaqlîbaz ji bûyeran tirsîyabû. Bona perçekirinê; bi çavên biriqîn, bi nukilên tûjkirî xwe avêtin pêş.

Jonathan pirsî: "Em ji vir bi dûr kevin Fletcher, tu çi dibêjî?"

"Vêga ez ji vêya re nabêjim Na!" Bi carekê hezar mîtroyî wê de çûn. Bi hezaran nukilê tûjkirî, di valahîye de, bi pêk anîna xêzên gilover tevdigerîyan.

Jonathan şaşbûyî pirsî: "Çima di dinyê de karê herî dijwar, bawerkirindana azadîya çûkekê ye? Bi hinek hewldan û xebatê wê azadîya xwe bidîtina. Çima em wilo zehmetîyê dikşînin?"

70

Fletcher, li himber vê der-dora nû di nava ecêbmayîyê de bû. "Te çi kir? Em çawa hatin vir?"

"Ma te ne gotibû, dixwazim ji nava refê çavzivirî derêm?"

"Belê, belê çawa bû kû..."

"Wek hergav Fletcher, bi hîndarî kirinê..."

Roja din ref, bengîtî ya xwe ji bîr kiribû. Lêbelê

Fletcher, ji bîr ne kiribû. "Jonathan ma tê bîra te, tiştên kû te li ser babeta vegeerîna ref, hez kirin û alîkarîya wan gotibû."

"Helbet."

"Ya rastî ez fehm nakim, tu çawa dikare ji refekî harbûyî kû qasî gavek berê li dû kuştina te bû hez bike."

"Ew, Fletch ya kû jê tê hezkirin ne ewe. Helbet ji rik û xirabîyê nayê hezkirin. Divê kû tu, di hundirê qaqlîbazekê de, qaqlîbaza bi rastî bibîne. Û di hundirê her yekê de rindîyê bibîne, wê derîne û pêşî wan bike. Evînîya bi rastî eve. Kû tu carekê wê tam bike, nema tu dev jê bigere. Çûkek tê bîra min, çûkek ciwan û dînoke. Navê wê Fletcher Lynd bû. Nû hatibû qewirandin û amade bû kû bi refê xwe re heta mirinê şer bike. Di aliyê din de, li ser zinarên dûr cehennema kû jar vedireşîya difikirî. Îcar ew li vir bihuşta xwe pêk tîne û ref li pêy xwe dikêşîne."

Fletcher zivirî ser fêrdarê xwe, çav tirsyayî bûbû.

Ez?... Kaşbûn ?... Tu dixwaze çi bibêje?... Ez?... Kaşbûn?... Li vir fêrdar tu yî. Tu nikare berde û here."

71

Divê kû tu, di hundirê qaqlîbazekê de, qaqlîbaza bi rasti bibîne. Û di hundirê heryekê de rindîyê bibîne wê derîne û pêşî wan bike.

"Ma li gor te ez nikarim berdim? Dibe kû Fletcherên din û refên din hebin kû motajî fêrdaran bin. Ne wilo?"

"Ma ez Jon? Ez qaqlîbazek ji rêzê me. Belê tu. Jonathan

keser ragirt." Kurrê qaqlîbaza mezintir ya bi tenê.  
Ne wilo?" Nerînên xwe ber bi bahrê wergerandibû.  
"Edî motajîya te ji min nema. Bi buhartina rojan, te  
dest bi dîtina qaqlîbaza bi rastî û bêtixûb Fletcher kir.  
Fêrdarê te ewe. Divê tu wê fehm bike û wê bijî."  
Piştî demek kurt, bedena Jonathan li hewa pêl da  
"Nehêlin min bi xwedêtîyê nasbikin. Mecalê nedê kû  
navê min bi şorên bêhişî miqeddes belav bibe. Te soz  
da min Fletch? Ez qaqlîbazekim. Heye kû... ez ji firînê  
hez dikim. Ronahîya wê kêmbû, li ber hilûbûnê bû.  
"JONATHAN!"

"Fletcher a reben! ji çav dîtina xwe bawer ne be, dîtînen  
te, yê bi tixûbin. Bi haybûnê binhêre. Bixebite  
kû tu bighîje bîra hînbûnê. Tu wê bi vî awayî bighê rêya  
firînê."

Û qaqlîbaza Jonathan hilû bû û tev li tunebûnê bû.

73

Ma qey tu sînor tune Jonallian!

Piştî demekê qaqlîbaza Jonathan li asîman dest bi  
dawerivînê kiri bû. Û li wir, rû bi rû rastî komê qaqlîbazên  
kû daxwaza hînbûnê dikirin hat. Bi dengê xemgîn:

"Berî kû hûn destpê bikin, divê kû hûn qenc zanibin  
kû..." got. "Qaqlîbazek, guhertina azadîyê ya bêtixûb  
û îmajek qaqlîbaza mezintire. Kû em vegerin ser  
bedena we... Ji serê baskekî heta serê baskê din, hemû  
bedena we, ji mijûlbûna we ne zêdetire."

Qaqlîbazên ciwan şaşmayî û bi meraq li wê dinhêrîn

"Ev şor naşîbihin qeydên teqle avêtîne. Çiqas xerîbe."



bi vî awayî difikirîn.

Fletcher keser ragirt. Bi çavên lêkolîn li wan nihêrî  
û got "Pir başe, em dest bi firîna sererast bikin." Bi vê  
gotinê re fehm kir kû dostê wê Jonathan, ji wê ne pêş-  
ketîtire û di ser de ne miqeddese jî.

Ma tu sînor tune Jonathan? Naxwe roja kû ez jî  
wek te hilû bibim nêzike. Kû ez li derava te xuyam,  
ezê çend teknîkê firîne pêşî te bikim.

Li himber şagirtên xwe bi zor xwe da hev. Kurtedemek  
çû kû, ew bi dîtina rastî dît. Dilê wê bi evînîyê tijî  
bûbû. "Ma qet tu tixub tune Jonathan" got û mizmizî.  
Pêşbazî ya hînbûnê dest pê kiri bû.

DAWÎ

75

FERHENG

A

Aso: Ufuk

Averû: Kavram

B

Babet Konu

Balkêş: Dikkat çekici

Balûpal: Gözaha

Bandûn Tesir, etki

Beng, Bengîtî: Çilgin, çilgmhk

Berbang: Şafak

Berêz: Sayin, saygideger

Bêdadî: Adaletsizlik

oluşturmak

Berhem: Eser, iiriin, sanat eseri

Berîdan: Yöneltmek

Berjewendî: Yetenek

Bersîv: Cevap, yanit

Bêhempa: Eşsiz, degerli

Bêzan Usanmiş, bikmiş

Bijarte: Seçkin

Bilindcîh: Doruk

Biryan Karar

Biyani: Yabancı

Bobelat: Felaket

C

Civat: Toplum, toplanti

Cûda: Ayri

Culhet: Cesaret

Ç

Çarqozî: Dörtgen

Çavbal: Alia gözle

Çavkanî: Kaynak

Çewt: Yanlış, ters

Çingîni: Çmlamak

Çirpandin: Kanat çirpmak

Çixîz: Çizgi

Çîrok: Masal

Çûk: Kuş

D

Damezrandin: Kurmak,

Danişîn: Duruşma

Dempêşî: Gelecek, gelecek zaman

Dawerivandin: Suziilmek

Dengvedan: ses yankılanması

Derav - : Sahil

Devjêgen Vazgeçmek, Vazgeçiş

Dewisandin: Bastirmek

Dewisandina Ketî: Alçak basmç

Dijwan Zorlu

Dilketî: Aşik

Dilîn: Duygu

Diwêj: Deyim

Duqozî: Açı

76

Eriyandin: Olumlamak

Jandan Canh

Ferisandin: Çözümlemek

Fêrdar: Egitmen, öğretici

Fêzs Gurur

Firk - Firkayî: Seyrek, seyreklik

K

Keravî: Pelikan

Keştî: ,Gemi

Gelemperi: Genellikle

Gengeşî: Munakaşa, tartışma

Geremol: Kalabakk

Gêj: Başı dönmiş, sersem

Guherte: Değişik

Gumlat: Kiime

X

Xêz: Çizgi

Xoşewîst: Sevgili

Xweza: Doga

H

Haybûn: Farkma varmak, ayılmak

Hengav: Bu anda

Hîndari kirin: Ahştirma yapmak

Hilû bûn: Saydamlaşmak

Holbûn: Siçramak

Lûsandin: Tunemek

M

Maf: Hak

Mêj: Eski, eskiden

Mîl: Kara mili 1609 metre

N

Nedîtban Soyut, görinmeyen

Nefîbûn: Sûrgiin olmak

Nepenî: Sir

Nûjen: Modern, Çağdaş

Nûvedan: Buluş, icat

Parxwan: Kas

Pêdandî: Sabit

Pêşbazî: Yarış, yarışma

Pêşwazî: Protokol, karşılama

Pêşande: Gösteri

77

Pêwendî: İlişki, ilgi, bağ

Pirsyari: Sorgu  
Pispon Uzman  
Pîke: Aşagiya dahş  
Qaqlîbaz: Marti  
Qedexe: Yasak  
Qîm: Arzu, istek, yetinmek  
Radan: Serzeniş  
Raman: Diişince  
Rexnevan: Eleştirmen  
Rewnaq: İşiltih, nurlu, parlak  
Rêgeh: Yöntem  
Rêgez: ilke  
Rik: Kin, inat  
Ristim: Sert kaya, granit  
Smûçk: Uç, kanat ucu  
Sêlxane: Kumsal  
Stêra rijyan Göktaşı, meteor  
Şêlo: Bulanik  
Şikev: Sandal, kayık  
Şîrokevikirin: Yorumhnak  
Şapê: Çig  
Taybetî: Özel  
Tehen Tarz  
Teheri: Usulca  
Tengezari: Tedirginlik  
Tevgerin: Devinim  
Tewanberî: Suçlamak  
Tixûb: Smir

Tipik: Nokta  
Tirsehêz: Korkunç  
Tûldan: Siçramak  
Vejen: Etken  
Vekêşandin: Germek, gerginhk  
Wate: Anlam, mana  
Ûşt: Sebep, neden.

78

FIRAT YAYINLARI

DÎLAN / Ömer Polat

SAÎD-Î KÛRDÎ / Rohat

ÇAGDAŞ TURK EDEBÎYATINDA KÛRTLER / Rohat

BARZANÎ / Dr. M. Siraç Bilgin

ZÎYA GÖKALP'ÎN BÛYÛK ÇÎLESÎ KÛRTLER / Rohat

Y. KEMAL'ÎN ROMANLARINDA KÛRT GERÇEÖİ / Rohat.

NATAŞA / Necati Siyahkan

ÎŞKENCE PSÎKOLOJİSÎ /Gustav KeUer

DÎWAN / Melayê Ciziri

SORO'NUNTOPRAKLARI/NaciKutlay

EVÎNA CEMÎLÊ / Cengiz Aytmatov

NÛBAR / Ehmedê Xanî

İTTİHAT TERAKKÎ VE KÛRTLER / Naci Kutlay

MEVLÛD / Mela Ehmedê Batê

ANLAYANA/NiyaziYaşar

BAKMAYA ÎZÎN YOK / Niyazi Yaşar

BÎTLİSLİ KEMAL FEVZÎ / Mabwsamj

ALMANYA'DAYİTENLER/HaydarlıŞUt

Bir Kûrt Multecisi MÎSAFİR "V" / Linus Reichlin

TURKLER KÛRTLER IRANLILAR / Prof. Egon Freiherr

KIRMIZILI SARI YEŞİL / Hakki Çimen

KERÛKULIK/AhmetAras

FIRATYAYINLARI

Divanyolu Ccd. Einbiidirek îşhani No: 15

Sultanaiimet / ÎSTANBUL

Tel: 516 05 91 Fax: 518 84 15

Romana qaqlîbaz" cara yekemin werdigere Kurdi.

Gernasê romaDê deri adetê qaqlîbaz. Niviskar bi

yana qaqUbazekf bir ba civatê rane dike.

dide xuyan ku kevneşupî ne qadsî kû mirov Jê bit

xurtf. Bes bila bizanibe çi dixwaze. Piştî eşkere kirina

daxwazê ber cll-t.. Ş

diqlne. Ew bi

Mlnw ne ralre, bed

Jl pa~ beden azad dlbe. (] bi evtntyê dighije bill1qtê.

Em bawerin hûnê ji qaqlîbaza Jonathan hez bikin.

\*\*

## SEROK Û SOKRATES

Di y a l o g

Hüseyin Kartal

1998

PROLOG

SEROK: Ma emê çima bikevin nav diyalogan? Eger em bi xwe bixwazin baş e lê çi karê

nivîskar bi me heye ku gotinan bi me bide gotin?

SOKRATES: Bi rastî mafê tu kesî tune ku bi me gotinan bide gotin. Mesela Platon bê haya

min bi cîldan pirtûk ji devê min nivîsandine, ez nizanim çi bikim?

SEROK: Divê em pirsê mafê nivîskar zelal bikin. Gelo nivîskarek dikare bê haya mirov li ser

mirov tiştina binivîsîne?

SOKRATES: Baş e, ev nivîskarê ku dixwaze li ser me tiştina binivîsîne çi nivîskar e?

Xwediyê çi cesaretî ye yan xwe çi dihesibîne ku quretî dike, dibêje ew nebe, em nikarin

bikevin pêwendiyê?

SEROK: Wî bi xwe divê em nas kiribin, beriya nivîsa wî bi salan ez û tu em di pêwendiyê de

bûn û metodên me eynî bûn. Vêga rabe quretî bike eyb e ji wî re.

SOKRATES: Pirsgirêk ev e ku emê bi wî re çawa bikevin têkiliyê, divê em pirsên xwe ji wî

bikin ka ew çi, çima, çawa difikire?

SEROK: Em bi wî re hertim di têkiliyê de ne lê têkiliya me bi xwe, rê nade ku em bi wî re

bipeyivin.

SOKRATES: Çawa yanî?

SEROK: Cesaret nake derkeve pêş me. Dixwaze dûtî me bi me re be û xwe di nav çar

dîwarên mala xwe de hepis kiriye, van tiştina dinivîsîne.

SOKRATES: Derkeve pêş me, bi me re bipeyive nikare hîn bêtir û xurtir binivîsîne?

SEROK: Ew dixwaze ji tesîra me dûtî bimîne. Li gor fikrên wî divê nivîskar azad be.

SOKRATES: Bila dîsa azad be, ma em jê re nabêjin wiha û wisa binivîsîne. Ma mafê me nîne



ku em li ser tiştên derheqê me de tên nivîsandin agahdar bin?

SEROK: Ew dibêje kengê nivîs tewa bû mafê Serok û Sokrates heye ku li ser wê ramana xwe

diyar bikin, rexne bikin. Ya rastî ez naxwazim xebera min ji karê nivîskaran hebe ka ew çî

dinivîsînin ji ber ku gava mirov ramana xwe bibêje, dibe ku di tesîra wê de bimînin.

SOKRATES: Tu dibêjî, em dev jê berdin, ew çî dinivîsîne bila binivîsîne?

SEROK: Tu çî difikirî?

SOKRATES: Ez çî bifikirim, nivîskar wê gotinên li gor dilê xwe bixe devê min. Ez

bixwazim nexwazim ewê gotina xwe bike, ne çêtir e ku em dev jê berdin?

SEROK: Belê, çî dinivîsîne ew û wîjdana xwe.

SOKRATES: Ya bê wîjdan be, li me îftira bike?

SEROK: Dîsa ew û wîjdana xwe. Em ji xwe bawer in; kî çî dibêje, dinivîsîne ew zane!

SOKRATES: Ez jî, mîna te difikirim.

SEROK: Wê demê em dest bi diyalogên xwe bikin.

Diyalog - I-

Kevir û Serê Kurdan

SOKRATES û SEROK

SOKRATES: Te got kevir li serê Kurdan bikeve, serê wan naşkê kevir dişkê?

SEROK: Belê, lê ne her car.

SOKRATES: Ev tiştêkî gelek ecêb e, ez dixwazim zanibim, mebesta te çî ye?

SEROK: Ez dizanim tu fîlozofekî pir mezin î, te mebesta min fam kir.

SOKRATES: Na, mezinî di we de ye. Ez merak dikim: Gelo bi rastî serê Kurdan kevir

dişkîne yan na û eger dişkîne, çawa? Ma kevir ji serê mirov ne hişkîr e?

SEROK: Kevir ji serê mirov hişkîr e. Tu van tiştan baş dizanî, lê ez metodên te dinasim;

tu dixwazî cewhera her gotinê bi pirsên hêsan zelal bikî.

SOKRATES: Tewecuha te ye.

SEROK: Ez pircaran ramankevirên gir davêjim serê Kurdan, lê kevirên min parçe parçe

dibin û plansaziya min mîna dilê min dixwaze pêk nayê.

SOKRATES: Ecêb e, ev Kurd çi mirov in?

SEROK: Di dema we de ji Kurdan re digotin Mad, Kardox ûwd. Rola Kurdan di dîrokê de ji

rola gelên din ne kêmtir e. Lê rewşa strateciya welatê wan hîştîye ku ew bi hezar salan di

bin destê dagîrkeran de bimînin...

SOKRATES: Pirsê kevirê...

SEROK: Belê, ezê bêjim.

SOKRATES: Gelo kevir hişk e yan serê Kurdan?

SEROK: Ma tu dizanî ku kevir ji serê mirovan hişkîr e.

SOKRATES: Lê ez nizanim ka kevir ji serê Kurdan jî, hişkîr e yan na. Ji ber ku min tucar

serê Kurdekî bi kevir re nedaye ber hev.

SEROK: Mebest ne hişkbûna hestî û goşt e.

SOKRATES: Mebest mejî ye?

SEROK: Belê, Kurd jî, ji gelên din ne cuda ne. Bi aqil in, lê her tim ji bo mafê xwe nafikirin.

Ji bo xwe ne ewqas berepêş difikirin. Kes tîn welatê wan digirin, li wan dixin, zar û zêçên

wan dikujin, ew ji vê yekê re tu çare nabînin. Yek çare bide pêş wan jî, bi cî naynin.

SOKRATES: Hîç şer nakin?

SEROK: Dikin. Pir caran şer dikin lê dost û dijmin ji hev cuda nakin. Başî û xirabî ji hev cuda nakin...

SOKRATES: û diçin serê xwe li keviran dixin, dişkînin?

SEROK: Mirov dikare wisa bêje. Lê di cewherê karê de mejiyê xwe bê ku bigîje kevîr parçe dikin. Kevîr li ba mejiyên wan nerm dimîne.

SOKRATES: Ez hîç tişt têngîjim.

SEROK: Dema hun di 'demokrasiya Athen' de dijiyan, demokrasî hîç tunebû. Ji wê rojê heta roja me 2394 sal derbas bûn, demokrasî hîç çênebû, lê dîsa navê wê di devê herkesî de ye.

Te digot ku herkes mîna hev bi aqil e. Tu li ser kolanan digeriya û bi herkesî re dipeyivî We

digot kole jî, bi kêmayî mîna yên ne kole bi aqil in, lê we tenê bi peyv digot, we tu rêxistin

ava nekir. Dîsa jî, ew demokrasiya bi navûdeng te kişand sêpê, bi dar ve kir. Rast e te

lehengî kir, dev ji gotina xwe berneda, xwe fîda kir, lê ji vê yekê çend kes ders girtin?

SOKRATES: Nizanim.

SEROK: Tenê Platon piçek jê ders girt û têngîşt ku tu demokrasî tune.

SOKRATES: Platon xortekî baş bû.

SEROK: Ji ber ku kevîr ji serê wî hişktir bû.

SOKRATES: Nizanim, min hîç kevîr li serê wî nexist.

SEROK: Min jî, hîç kevirê kevir li serê Kurdan nexist.

SOKRATES: Tu çawa dizanî ku serê wan ji kevir hişktir e?

SEROK: Dema wan tu bi dar ve kirî şûn ve di mejiyê mirovahiyê de guhertin çêbûn. Platon

ûwd. xwe li ser jiyana civakê bi fîlosofî kûr kirin. Mirovahî gelek nîrxên hêja ava kirin.

SOKRATES: Ji wê demê re dibêjin antîkdem (kevnedem.)

SEROK: Antîkdem dema destpêka rûmetên raman û avahiyê ye. Lê hîn çar sed sal derbas

nebûn ku dema herî xirab di dîroka mirovatiyê de dest pê kir.

SOKRATES: Bawer im yekî bi çarmixê kirin, ne?

SEROK: Jê re digotin Isa. Piştî wî bi çarmixê kirin çend sedsal şûn ve demeke dest pê

kir ku ji aliyê pêşveçûnên raman û avahî zor xirabî berepêş xist.

SOKRATES: Ji wê demê re nabêjin Navîndem, yan jî, tarîdem?

SEROK: Belê.

SOKRATES: Di Navîndemê de serê desthilatdaran ji kevirê ne hişktir bû?

SEROK: Mirov dikare wisa bêje.

SOKRATES: Ma serê Kurdan di wê demê de ji kevirê ne hişktir bû?

SEROK: Mirovahî, di pêvejoka vê demê de pir zor û zehmetî kişand. Hezar sal zêde di vê

dema tarî de çîrûskên ronahiyê dem bi dem vedidan, lê zû dihatin fetisandin. Gelek kesên

mîna we hêja di vê demê de hatin kuştin. Avahî hatin xirakirin.

SOKRATES: Na, ez bi hêja û nehêja bawer nakim. Tenê dikarim bêjim ku serê min ji kevirê

nermtir bû û gava kevir lêxistin dîsa jî, neşikiya lê ez mirim.

SEROK: Belê her tişt di vê gotina we de veşartî ye. Hun nemir in, hun dijîn.  
Herê serê we  
neşikest lê pelixî, mejiyê we belav bû, xwe berda ser cîhanê. Piştî hezar  
salî zêde derbas  
bûn, dem dîsa xwe guhert. Nûdem dest pê kir. Lê nûdem jî, di nav xwe  
de beş bi beş heta  
dema nûjen belav bû. Mirovahî pir pêş ve ket. Mirovahî çiqas pêş ve ket  
ewqas jî, paş ve  
çû...

SOKRATES: Ez têngajîm, mesela kevirê û serê Kurdan..!

SEROK: Ne tenê. Ew dilopek ji deryayê bû. Rast e, mirov bi teknîk û raman  
pêş ve çûn. Lê  
her pêşveçûn bi xwe re paşketinek jî, tanî.

SOKRATES: Ev ne zagona suruştê ye.

SEROK: Ne tenê. Zagona suruştê her tim pêş e. Lê carna hêz û bedewiya  
pêşketinê bi  
felaketek ji holê radibû, mirov pir tiştan ji nû ve dest pê dikirin.

SOKRATES: Çawa?

SEROK: Wekokek herî teze ew e ku hin dewlet bi duruşmên armancên  
Mirovahî ava bûn û  
carekî din têk çûn. Ji ber ku tenê duruşme nikarin jiyana civakê bidomînin,  
pêwîst e  
duruşme di jiyane de pêk bên, li anegora jiyane bin. Her tişt ji nû ve divê  
bê hêzkirin...

SOKRATES: Baweriya min bi qiweta raman heye.

SEROK: Em bên pirsê serê Kurdan û kevir.

SOKRATES: Ez pir bi heyecan im.

SEROK: Mînak ez sed caran gelek pirs bi komikên mirovan re zelal dikim...

SOKRATES: Ez hêza te ji hêla rêxistin, raman ûwd. baş dizanim.

SEROK: Lê pir caran cardin vedigerim û ji serî ve dest pê dikim.

SOKRATES: Sebr û heyecana te ji bo kar baş hîs dikim..

SEROK: Mînak ez carna gotinek li ser beşekî civakê dibêjim, şaş tê famkirin. Gava

dilêşiya xwe li ser hin awayan diyar dikim, hinek hene bê ku tê bigîjin ez çî dibêjim, min

tekrar dikin...

SOKRATES: Tekrar baş e...

SEROK: Tekrar baş e, eger mirov bi naverokê baş tê gihîştibe. Lê mirov tê negihîştibe

tekrar pir zarar e.

SOKRATES: Tu pir bi êş î...

SEROK: Ji êşa xwe çareyan derdixim. Pir kes ne êşa min ne jî, çareyên didim pêş fam dikin.

SOKRATES: Lê dîsa jî, mîna ku fam kiribin şanî didin?

SEROK: Hîn xirabtir. Pir caran avahiyên pêkhatî xira dikin, ramanên serkeftî vala derdixin.

SOKRATES: Heyf. Ev çî mirov in, çî kar dikin?

SEROK: Piranî ji wan wezifeyên gelek pîroz hilgirtine ser milên xwe. Hin duruşman

davêjin, lê mana wan duruşman di jiyane de çî ye(?) li ser nasekinin. Tu dibêjî qey mirovên

navîndemê ne.

SOKRATES: Mînak ji kerema xwe...

SEROK: Mînak ez dibêjim, gundîno hun xwedî li welatên xwe dernakevin, tirsonek in, li ber

leşkerekî dilerizin; roja din gelek kes hene ku xwe rewşenbîr dibînin, bi dev hêrîş dikin

gundiyan. Ji ber ku bingeha gotinê nafikirin, dest bi dijûnan dikin.

SOKRATES: Ew çawa rewşenbîr in? Ma çima gelê xwe, gundiyan xwe hişyar nakin,

eger bi xwe hişyar in?

SEROK: Roja din ez gotinek li ser rewşenbîran dikim, dibêjim rewşenbîrên Kurd bi

wezîfên xwe ranabin, ronahiya serê xwe gur nakin û nadin gelê xwe. Ez dixwazim hemû bi

kar hev mezin bikin, mezin bifikirin, çalakiyên mezin bikin, herkes ji yê din fêr bibe; lê hin

ji wan radibin dixwazin dersê bidin yê din. Ez dibêjim pirs têgihiştina demê ye, hinek

radibin mîna mamosteyên dibistanan dûr û dirêj li ser 'rewşenbîr çi ye' dipeyivin; ma yekî

ku nizanibe rewşenbîr çi ye, ji xwe çi têkiliya wî bi rewşenbîran re heye. Gava ez hin

nirxandinên wisa dikim, hema hin kes dest pê dikin, rewşenbîran didin ber dijûnan; tiştên

ecêb dibêjin. Ji wan re dibêjin hun kûsî ne, nizanîm çi ne...

SOKRATES: Qey ji ber kûsîti serê wan kevir dişkîne?

SEROK: Pirsên provokatîf dikî Sokrates!

SOKRATES: Bibexşe! Bi rastî karê we pir zor e. Ez ji mamostetî bêtir xwe timî şagirt

dihesibînim. Ez dixwazim ji Kurdan û li ser Kurdan hûrkolînek çêbikim. Hêvî dikim ku emê

hîn pir diyalogan deynin. Ez nizanibûm ku Kurdbûn evqas zor e.

SEROK: Mesele ew e ku mirov bersiva pirsên zor bide, kar û barê mirov çiqas zor be jî, xwe bêçare nebîne. Ez mirovên Kurd baş nas dikim, ji wan ne bêhêvî me. Helbet emê diyalogên xwe hîn bidomînin...

SOKRATES: Tu dibêjî wê rojek bê ku wê kevir karibe serê Kurdan bişkîne?

SEROK: Tu pirsê pir baş fam dikî. Ew roj ne dûr e.

Diyalog -II-

Form û Giyan

SOKRATES

REWŞENBÎR, NALSRAZOB û

SEROK

SOKRATES: Ka ji min re diyar bikin hun çawa rewşenbîr in; navê we rewşenbîr e, yan jî,

beşê hun li ser dixebitin wisa bi nav dibe?

REWŞENBÎR: Bibuhre mîrza Sokrates, ez baş tê negihîştim, hun ji min çi bersiv

dixwazin?

SOKRATES: Mirov pirsan bi pirs nabersivîne. Baş e, ka ji min re diyar bikin maneya

rewşenbîr mîna nav û maneya rewşenbîr mîna jiyan yektişt in yan na?

REWŞENBÎR: Ez dibêjim ne yektişt in lê hevbeş in.

SOKRATES: Yektişt bi xwe yektişt e yan dibe pirtişt? Eger yektişt dibe pirtişt, çima

em dibêjin yektişt û eger pirtişt yektişt e, çima em qala pirtişt dikin?

REWŞENBÎR: Ez dibêjim yektişt nikare bibe pirtişt, eger ew bi rastî yektişt be û tiştê

pirtişt be, ew jî nabe yektişt.



SOKRATES: Hun bi bersivên xwe pir bi lez in. Birêz Serok ji min re gotibû ku kesên xwe

rewşenbîr dibînin, bê ku têbigîjin pirs çî ye bersivan didin. Birêz Serok tu dixwazî ramanên

xwe li ser rewşenbîran ji min re zelal bikî?

SEROK: Ez dixwazim hun hinek din berdewam bikin, bawer im wê ji ramanên min re pir

gerek nemîne, gava ez te gohdarî dikim, pir tişt fêr dibim. Bila kesên xwe tiştêk dibînin

piçek di nav lepên we de nezaniya xwe bibînin.

SOKRATES: Tu pir bi sebir î.

REWŞENBÎR: Birêz Sokrates wisa dibînim ku hun bi bersivên min ne dilxweş in!

SOKRATES: Ez ji her bersivan ders derdixim, gelek tişt fêr dibim. Hun ji xwe re dibêjin “ez

rewşenbîr im?” Gava dibêjin çîma dibêjin?

REWŞENBÎR: Hun jî, ecêb in, ji ber ku ez nivîskar im, min zanîngehê tewa kiriye, ez tixtor

im, abûqat im, navê min heye, ma ev hemû ne bes in?

SOKRATES: Giyan û raman beriya her tiştan tîn. Beriya ku forma mirov, yanî laşê mirov

hebe jî, giyan û raman hene, lê ne xwedîqalib in. Kengê qalibê xwe dibînin tê de bi cî dibin.

REWŞENBÎR: Çî pêwendiya vê gotinê bi axaftina me heye?

SOKRATES: Carna giyana mişkekî belkî bi şaşî bikeve şêrekî; ma ew şêr pisîkê bibîne

nareve, ji tirsan xwe venaşêr e?

REWŞENBÎR: Belê.

SOKRATES: Em bêjin giyana şêrekî bikeve mişkekî, wê demê ku mişka şêrgiyan

pisingê bibîne qey dibeze?

REWŞENBÎR: Bawer nakim, ji ber ku mişk xwe mîna şêr dibîne.

SOKRATES: Baş e; ma pising wê hêrîşê mişkê şêrgiyan neke û wî parçe neke, nexwe?

REWŞENBÎR: Belê, ji ber ku ew dîsa mişk e.

SOKRATES: Em bêjin, mirovek heye, ne zana ye lê xwe zana dibîne. Xwe çiqas zana,

pispor bihesibîne jî, nizane. Gelo ne mumkun e ku giyana yekî zana ketibe forma yekî nezan

û herdu li hev nayên. Em bêjin giyana goştfiroşekî (qesab) ketibe qalibê tixtorek, gelo ew

qalibtixtor wê bikaribe li nexweşan mêze bike, derman binivîsine?

REWŞENBÎR: Bawer nakim.

SOKRATES: Emê hêdî hêdî hevdu fam bikin...

REWŞENBÎR: Hêvî dikim...

SOKRATES: Em bêjin kesek heye xwe rewşenbîr dibîne, lê giyana wî ne giyana

rewşenbîrek e, giyana kûsiyek e. Forma wî jî, forma rewşenbîr e. Gelo wê kûsîgiyan karibe

welêw ku di qalibê rewşenbîrekî de be jî, bigîje têgîştin û afirandinên rewşenbîrgiyanek?

Em bêjin di qalibê rewşenbîrekî Kurd de giyana biyaniyek heye û ev giyan ne kurdperwer e;

ma wê dilê wî rewşenbîrî bi Kurdan bişewite, ji bo gelê Kurd xebat bike?

REWŞENBÎR: Çi pêwendiyên van pirsan bi min re hene birêz Sokrates?

SOKRATES: Bi rastî kevir ji serê Kurdan nermtir e. Ez dixwazim bersiva 'çi pêwendiyên

van pirsan bi te re hene' birêz Serok bide.

SEROK: Min qala kevir û serê Kurdan kiribû...

SOKRATES: Ya rastî vêga baş têdigîjim, mebesta we çi bû.

SEROK: Yek û yek dibe çend birêz Rewşenbîr?

REWŞENBÎR: Yek û yek dibe dido, ma ev çi pirs e?

SOKRATES: Hun pir bilez in birêz rewşenbîr...

SEROK: Çima yek û yek dibe dido, ji kerema xwe Nalsrazob tu bersiva min bide!

NALSRAZOB: Hin tişt hene bê sedem in, ne pêwîst e mirov li egerên wan bigere.

SOKRATES: Bê eger hîç tiştek nîne. Eger bê eger be ew tenê hînbûneke şaş e.

REWŞENBÎR: Bi rastî êdî pênegîjim hun çi dibêjin..

SEROK: Tişt nabe, tu ji xwe li paş hertiştî mayî... Yek û yek dido ye û ne dido ye jî.

Rewşenbîr rewşenbîr e û ne rewşenbîr e jî, ne wisa ye mamoste Nalsrazob?

NALSRAZOB: Ma ez ne mecbûr im her tiştên hun dibejin qebûl bikim..

SOKRATES: Pir baş. Divê hun timî bi şik nêzîkê tiştan bibin. Lê sedemê şika xwe jî,

divê hun bêjin. Eger hun sedem û îspatan neynin û gotina me jî nerizînin, tu maneya gotina

we namîne, hun nikarin bibin rewşenbîrekî Kurd û filozof; biyanî dimînin.

SEROK: Birayê Nalsrazob, rewşenbîrê hêja, mebesta min rabûna her Kurdekî ye. Bi rabûna

Kurdan, mezinlîstina wan ez pir serbilind dibim. Biyanîbûna we rewşenbîran ji pirsê re bes

e. Mirov divê bi kêmayî li paş dijmin nemîne, rastiya dijmin dibîne gerek hun jî, karibin

bibînin. Mîna mamosteyê mezin Sokrates jî, dibêje, mîna ku di forma we de biyaniyek,

nezanek hebe, ev rewş beriya herkesî divê we aciz bike, hun hesabê ji xwe bipirsin. Eger

birastî hun rewşenbîr in, ne tenê di forma rewşenbîran de ne, xwe bi gelê xwe mezin bikin.

Ehmedê Xanî mînak bigrin, wî bibuhrin...

SOKRATES: Eger nivşa nû ya kevn nebihure, di wê civakê de pêşketin naçe ser.

SEROK: Wekokan bide, Sokrates!

SOKRATES: Eger Platon (Eflatûn) nebûya, hunê îro nizanibûna ramana min çi ye. Eger we

tenê mîna serokatiyên pêş xwe bikira, serketina we ne mumkun bû. We berjewendî ji

tecrûbên hemûyan girt lê mîna wan nekir.

REWŞENBÎR: Hun her car qala tişteke dikin, ez pê nagîjim. We gotibû yek û yek dido ye û

ne dido ye, çima?

SEROK: Baş ku me dest bi geometrî nekir, ev rebenê han hîn di destpêka arîtmetîkê de

maye. Bersiva wî bide mamoste Sokrates.

SOKRATES: Yek û yek dido ye ji ber ku du heb yek tîn ba hev dibin dido. Yek û yek ne

dido ne ji ber ku her yek bi serê xwe yek e, ne dido ye, yanî du heb yek in. Yek dikare bibe

nîv dîsa ne yek e. Çar heb nîv dikarin bîn cem hev dîsa dibin dido.

SEROK: We fam kir rewşenbîr? Yanî yek yek e yan ne yek e, ew jî pirs e. Yek çima yek e,

çima dibe nîv, çima dibe dido, li ser van pirsan jî, hun bifikirin...

SOKRATES: Mînak rewşenbîr jî, hebû; çima rewşenbîr? Kî dibêje, çima dibêje, mirov

bêje dibe, yan sedem gerek e? Sedem hebe dibe yan ji mirov re wisa dixuyê? Her tiştê ji

mirov re bixuyê jî, wisa ye yan ne wisa ye? Wisa be çima, ne wisa be çima wisa dixuyê, em

çima wisa bi nav dikin?

SEROK: Mamoste Sokrates pir zor neke. Ka bila ew bersiva hin tiştan bidin, emê karibin

rojên pêş hîn jî, sohbeta xwe bidomînin.

SOKRATES: Tu Kurdên xwe pir baş dinasî!

SEROK: Ew ne tenê Kurdên min in, ez jî, Kurdê wan im.

SOKRATES: Lê ew te fam nakin.

SEROK: Rojek bê wê min baş fam bikin. Ez bi dil û can bi wan re me. Ew diçin xulamiyê

ji pir kesên noker re dikin, li ser min jî, dixwazin axatî bikin.

SOKRATES: Aliyekî axatî her tim xulamî ye. Ji xulamî axatiyê tund derdikeve.

SEROK: Belê. Kurd pircaran ji dijmin re xulam, li hember hev axa ne.

SOKRATES: Heyf. Xwezî ne axa ne xulam bûna!

SEROK: Armanca min rakirina xulamî û axatî bi her awayî ye.

SOKRATES: Serkeftin pêşeroja te ye. Daxwaz û ceht mirov dibe serkeftinê.  
Di te de herdu

jî, bi awayekî xurt dibînim.

SEROK: Armanca min mezinkirina insanan e. Eger yek rewşenbîr be, bila  
bi rewşenbîrî

mezin be, gundî be bila bi gundîtî mezin be, cahîl be bila hîn bibe, bibe  
zana. Bila zanatî

dilnermî be, ne pozbilindî; ji ber kesek tune ku her tişt bizane, herkes hin  
tiştan bi sînor

dizane. Her tişt, zanyarî jî, bi sînor e.

SOKRATES: Mirov nikare bibe zanayê tewa, lê dikare zanebûna xwe bi  
tecrûban binexşîne.

SEROK: Te pir xweş anî ziman.

SOKRATES: Spas. Ez dixwazim em sohbetên xwe bidomînin. Ez ji we pir  
tecrûbe digrim, pir  
tiştên nû fêr dibim.

SEROK: Tewecuha te ye. Sohbeta te ji bo me tijî ders in.

SOKRATES: Ez çiqas Kurdan dinasim, pirsê wan bala min bêtir dikşîne.

SEROK: Bi hevxebata te emê gelek dilşa bin, Sokrates. Pir Kurd hene xwe  
nêzîkê me nakin.

SOKRATES: Çi heyf. Ew çiqas feqîr in.

SEROK: Belê. Em dixwazin ew jî, dilberz bin.

SOKRATES: Belkî ew baş tê nagîjin hun ji wan çî dixwazin, carekî din ji wan  
re bêjin!

SEROK: Em her car dibêjin, emê her car jî hîn bêjin.

SOKRATES: Çi ji destê min bê ez bi vê nezaniya xwe amade me bi we re  
bim.

SEROK: Emê bi zanyariya we serbilind bin.

Diyalog - III-

Sohbet li ser Wêje

SOKRATES

EHMEDÊ XANÎ, REWŞENBÎR û

SEROK

SOKRATES: Serokê birêz, va ye Ehmedê Xanî, li vê derê ye, em dikarin ji wî hin pirsan li

ser wêje ûwd. din bikin, ew jî, bi zanebûna xwe ya giran û bi rûmet bi bersivên xwe me ronî

bike.

SEROK: Rast e. Fermo dest pê bike, çi dixwazî pirs bike!

SOKRATES: Birêz Ehmedê Xanî, kûrê gelê bindest, hozanê sedsalan nemir, hun ji me re li

ser rewşa wêjeya Kurdî nûjen çi dikarin bibêjin?

EHMEDÊ XANÎ: Li min fedî ye ev pesn û rûmet / li pêş mirovên zana û qiwet / hîn zû ye

gotin li ser demwêje / wêjeya nûjen pêş û dirêj e.

SOKRATES: Rast e, hîn bişkuvên wêjeya nûjen dest bi vebûnê nekirine, lê hun li ser

pêşerojê çi difikirin? Gelo wê kengê coşa nivîs bi mistewa bilind xwe ronî bike?

EHMEDÊ XANÎ: Berî hertiştî pêwîst bû tacek / daku bi kesî nebe muhtacek / ji bo kurd

nebin bindestên timî / ji xwe re deynin bingehê hîmî / Ziman û wêje zû dibin ronî / ger mirov

bingeh bo welat danî / pêşketin û pêşveçûn û nûjenî / hemû dest pê dikin bi vî cewherî.

REWŞENBÎR: Ya rastî ez ne pirsên Sokrates ne bersivên birêz Ehmedê Xanî tê nagîjim, ji

kerema xwe hun dikarin mebesta xwe hîn zelaltir bînin ziman?

SOKRATES: Baş e. Hun çî kar dîkin, pîşeya we çî ye birêz Rewşenbîr?

REWŞENBÎR: Min îlmên fîlosofî û sosyolojî xwandine, niha jî, li ser Ehmedê Xanî û

helbestên wî dixwazim xebat çêbikim.

SOKRATES: Tu pirsên min ji bo we nemane, bersivên ez bidim we birêz rewşenbîr ji kok

hîç nîn e.

SEROK: We fîlosofî xwandiye, baş e. Hun Sokrates dinasin?

REWŞENBÎR: Belê, fîlozofek Yonanî ye.

SEROK: Xwe li ser çî beşî kûr kiriye, di kîjan demê de jiyaye û çawa têkoşîn daye?

REWŞENBÎR: Bawer im, pir kevn e, min hîç berhemên birêz Sokrates nexwandine.

SOKRATES: Berhemên min nîn in.

REWŞENBÎR: Çawa? Navê te çima li ser hemû fîlosofan e?

EHMEDÊ XANÎ: Va ye rewşa me, tac û fîlozof / bizanin çima wêje paş û qof / lê hêviya

min ew dem ne dûr e / ronahiya nûjendem jî, pir kûr e.

SOKRATES: Li ser wêje pirsên min neman.

REWŞENBÎR: Ma, ka tu bersiv jî, nehatin. Eger hun rê bidin ez dixwazim hin pirsan ronî

bikim, ka çima wêjeya Kurd ewqas li paş maye, yan jî pêş naçe...

SOKRATES: Ez bawer im, birêz Ehmedê Xanî bersiva min bi kurahî da, lê tu dikarî dîsa jî,

ramana xwe ji me re bînin ziman, daku em hîn jî, ronîtir bibin.



REWŞENBÎR: Sedema pêşneketina ziman û wêjeya Kurdî ew e ku tu îmkan di destên

Kurdan de, bi taybetî jî, nivîskar û rewşenbîran de tunebûye...

SOKRATES: We bê îmkan zanîngehê tewa kir?

REWŞENBÎR: Hun zanin hin taybetiyên nivîskar û rewşenbîran hene, divê mirov wan

bide ber çav. Lê di me Kurdan de kes rûmeta nivîskar û rewşenbîran nizane.

SOKRATES: Ne we got derfet tune. Eger derfet tune û we tiştek nekiriye, hun dikarin

bikevin kategoriya nivîskaran?

REWŞENBÎR: Çima na? Ma derfet hebûn ez nebûm nivîskarekî, fîlozofekî mezin?

SOKRATES: Hun ji kî, bi çi awayî alîkarî dixwazin? We bi awayekî anî ziman ku wêjevan,

fîlozof ûwd. yên mezin ji ber bêderfetiye çênebûne...

REWŞENBÎR: Belê.

SOKRATES: Tiştek çênebûbe, mirov dikare rûmeta wî bigre, alîkarî bike, yan jî, jê re

derfetan pêşkêş bike?

REWŞENBÎR: Na, nikare.

SOKRATES: Wê demê gotina ku derfet nîn in jî, bê mane dimîne. Derfet ji bo kesên

bixwazin tiştan bikin hene. Derfet ew kes bi xwe ne. Nivîskar bi xwe nikaribe biafirîne, hun

derfetan giş bixin xizmeta wî jî, nikare. Fîlozof ji bo ku fîlozofî bike, li anegora min

pêwîstiya wî bi tu derfetan jî, nîn e.

SEROK: Birêz Sokrates, tu hîn rewşenbîrên me baş nas nakî. Pira nî tîn qala derfetan dîkin,  
em bi giş derfetên xwe dixin xizmeta wan lê dîsa jî, gava ji çav wînda dibin ji bîr dîkin.

Wekî din we pir baş anî ziman, bi gotina ku derfet tu rêyên mezin ji afirandinan re venake.

Divê di mirov de, di mejiyê mirov de teqandin çêbin. Yek nikaribe mejiyê xwe mîna volkan  
pêk bîne, bi agirên mejiyê xwe ronahiyên mîna rojê biberiqîne, di destê wî de ji gilî û gazin  
bêtir tutişt namînin.

SOKRATES: Te pir xweş anî ziman, tam ji dil û hişê min...

SEROK: Rewşa nivîskar û rewşenbîrên me ya vê demê gilî û gazin e.

EHMEDÊ XANÎ: Heyhat ev derfet îro bo Kurdan / Dîrokê binêr talan û tofan / Ev rabûn û  
serhildan / Ev zanistî û Berxwedan / Yekemîncar e ji bo Kurdistan / Ji bo Kurdistan wek  
baxça gulên

REWŞENBÎR: Nizanim hun hemû qala çî dîkin? Tu dibêjî qey Kurdistan serfiraz bûye,  
tenê ez pê nizanim...

SOKRATES: Rast e, te baş got. Kurd tirsê tirsandine, giyana xwe ji qirêjiyê paqij dîkin.

Kesek îro bixwaze Kurdan fam bike, pêwîst e bi metodên berê xwe nelivîne.

SEROK: Hun çî diponijin, birêz Nalsrazob?

NALSRAZOB: Ez çî bêjim. Tu dibêjî qey hin tişt ji min re jî, ronî dibin, lê bi rastî ez pê re

nagîjim ku rewşa xwe li vê anegorê zelal bikim...

SOKRATES: Eger we dest bi şikê kiribe baş e mîrze Nalsrazob.

REWŞENBÎR: Ez nizanim ev Nalsrazob çima dest bi şikê kiriye, ji bo çi? Ez tînegîjim

Ehmedê Xanî çî dibêje, Sokrates dibêje tu berhemên wî tunene, ew çawa ewqas bi nav û

deng bûye, ezê ji kî bipirsim, wê kî bikaribe bersivên min bide...

SOKRATES: Hun dest bi pirsan bikin, wê rojek bê hunê bikarin bersivan jî, doz bikin? Tiştê

baş ew e ku mirov hertim pirs bipirse. Bi pirsan mirov dikare ronî û zelalî bibîne. Divê

mirov hîç nebêje “ez zanim”, mirov çiqas zanibe, ewqas nezan e. Mirovê herî bi aqil ew e;

ew zane ku tiştêk nizane.

REWŞENBÎR: Ez we hîç fam nakim birêz Sokrates. Ez ne we, ne birêz Serok, ne jî, birêz

Ehmedê Xanî hîç yekî ji we fam nakim. Ez êdî birêz Nalsrazob jî, fam nakim. Ez hîç

tiştêk nizanim...

SEROK: Belkî cara ewil e ku we gotineke rast got. Baş e, emê hev hêdî hêdî fam bikin.

Zanistiya herî mezin ew e ku mirov xwe mezin nebîne, xwe zana nebîne. Eger mirov zana be,

bi zanistiya xwe li pêş çav e, ne bi pesna zanistiya xwe. Birêz Sokrates, emê karibin bi

rewşenbîrên nûjen serkeftineke çandî, hunerî pêk bînin yan na?

SOKRATES: Ez bawer im.

SEROK: Tu bi çi bawer î?

SOKRATES: Ez bi hêza te bawer im, ez bi rewşenbîrên Kurd bawer im. Ev çekê tu didî

destê wan ne biçûk e; wê rojekê bikarin pêk bînin.

SEROK: Birêz Ehmedê Xanî, tacê helbestvanan, fîlozofê nemir û gelperwer hun çi difikirin?

EHMEDÊ XANÎ: Herwiha berdewam be serkeftin / Salên pêş me êdî Kurd ne bîndest in/

Afirandina ziman, wêje û dewlet / Girêdaye bi serxwebûna siyaset

SOKRATES: Ehmedê Xanî fîlozofekî, zanayekî, wêjevanî berz e...

SEROK: Belê. Em dixwazin di dema me de jî, Ehmedê Xanî derkevin.

SOKRATES: Ji ber vê yekê hun pir zor didin rewşenbîran, nivîskaran...

SEROK: Belê. Eger me zor nedaba gerîla, tirsê Kurdan ne dişkiya. Ma Kurdên feqîr û

belengaz karibûn rabin ser xwe û bala dinyê bikşînin ser pîrsgirêka xwe?

Ma wekî din Kurd

karibûn xwe bikin bombe biteqînin. Ev rewş ji bo her beşê civakê derbas dibe. Mirov zor

nede, zayîn çênabe, zor pîrika zayînê ye pir caran...

SOKRATES: Tu jî, mîna min pîrikî dikî, ji kesên ducan re, ne? Diya min bi xwe pîrik bû û

jinên ducan dida zayînê. Ez jî, ji wê pişeyê fêrbûm ku mirov çawa dide zayînê. Eger ez bi

mirovê re dest bi axiftinê bikim, metodên pîrikî pêk tînim, bi vî awayî kesên herî nezan jî,

gelek tiştên zana dizên...

SEROK: Mirov dikare piçek bide ber hev, lê karê min hîn jî, diwartir e. Pircaran dergûş

hîn di rihma diya xwe de, ne tendurust in, divê ez dergûşa berî zayînê jî,  
derman bikim ku  
tendurust bizên.

SOKRATES: Belê, ez baş têdigîjim. Lê diya min nikaribû di zikê dayê de  
zarokan derman  
bike...

SEROK: Lê tu dikarî Sokrates, ez zanim tu baş dikarî. Tê bîra min te çawa  
ramanên hin  
şagirtên xwe hîn ku nehatibûn ziman, bi pirsên xwe rast dikir.

SOKRATES: Lê ez dibînim riya we gelek serkeftî ye. Ya me tenê raman û  
axaftin bû, ya te  
zor e ji ber ku tu jiyane jî, diguhirînî...

Diyalog -IVTevgeriya

Xopan

SOKRATES

MAXO, REWŞENBÎR û

SEROK

SOKRATES: Ya rastî ez Maxo nas nakim, cara yekemîn e ku ez wî dibînim.

SEROK: Min digot qey hun hev dinasin, ji ber ku ew xwe zû nêzîkê mirovê  
mîna te dike û

heya jê bê dixwaze dûrî me bixîne.

SOKRATES: Çawa?

SEROK: Herî baş ew e ku tu bi xwe pê re sohbet bikî.

SOKRATES: Ezê gelek dilxweş bim, ger bikarim ji wî hin tiştina fêr bibim.

SEROK: Em hêvî bikin, belê ka were Maxo, tu Sokrates dinasî?

MAXO: Fermo Serokê min, ser seran; eger hun bixwazin emê wî binasin.

SEROK: Bawer nakim tu wî binasî. Lê hêviya min, tu dostaniya me pê re  
daniye, xira nekî!

MAXO: Na, Serokê min, ezê wî tevger bikim.

SEROK: Sokrates rewşenbîrekî Yonanî ye...

MAXO: Serokê min ev rewşenbîr tucar nabin mirov...

SEROK: Çima, qiloçên wan hene? Berî mirov gotina xwe li ser tiştan dawî lê bîne, tu

hema biryara xwe li ser wan didî. Daxwaza min tu hinek bi Sokrates re sohbet bikî, paşê emê

dîsa bîn ser mijara xwe.

SOKRATES: Birêz Maxo, we got, rewşenbîr tucar nabin mirov. Ez dixwazim bizanim, gelo

ka rewşenbîr çi ne, çi karî dikin?

MAXO: Binêrin hevalê delal, wisa dixuyê ku haya we ji rewşenbîran hîç tune. Divê mirov

berî hertiştî welatparêz be. Bi ehlaqê hurdeburjuva kesek nikare bibe welatparêz, ji bo welatê

xwe xebat bike. Rewşenbîr ew e ku bersiva pirsgirêkên gelê xwe bide. Ma rewşenbîrên me

wisa ne? Na, ew mîna axa ne, dixwazin rehet wan li cî be û navê wan mezin be.

SOKRATES: Hun qala tiştên gelek girîng dikin birêz mamoste Maxo. We got bersiva

pirsgirêkên gel; hun dikarî çend mînakan bidin daku ez baştir têbigîjim, mebista we çi ye?

MAXO: Li welat gelek nirxên gel hene, gelê me zehmetkêş û perîşan e; gerek mirov vî gelî

nas bike, fam bike, ji derdên wî re bibe melhem...

SOKRATES: Baş e. Mîna têdigîjim gelê Kurd di bin zordariyeke mezin, di nav

zorkêşiyêke tewanbar de ye. Pirsê min ev e: li anegora ramana we çare çî ye? Bersiva

pirsgirêkan bi çî awayî divê bê dayîn?

MAXO: Binêre hun naxwazin fam bikin. Ji bo kesên bixwazin fam bikin, mesele gelek vekirî

ye, hun çîma pirsê di devê xwe de dibin tînin?

SOKRATES: Mebesta min têgîştina meselê ye. Lê hun bersiv nadin min, tenê qala zor û

zehmetî dikin. Ez dixwazim çareserî çî ye, bizanim.

MAXO: Tênegîştina vê meselê çî ye? Ji xwe hun hemû rewşenbîr wisa ne. Gava hun devê

xwe vedikin pir mezin dipeyivin, lê gava mesele çareserîya pirsê, bersiva demê be, hun ji kar

direvin. Kî zane gelê we ji destê we çî dikîşîne!

SOKRATES: Daxwaza min jî, ferbûna riyên çareseriyê ne.

MAXO: Ma pirsê evqas zelal e û ku hun dîsa jî, têngîjin, ez çî bikim? Heval, birêz mamoste, navê we çî bû?

SOKRATES: Sokrates, Sokrates mêrê Xanthippe.

MAXO: Ha hevalê birêz Sokrates divê hun ji bo gelê xwe bixebitin. Pirsê Kurdan giran e, dev

jê berdin, serê xwe pê neyêşînin, têngîştina pirsê Kurd zor e.

REWŞENBÎR: Mamoste Maxo, dîsa jî, mirov hinek zelal bike, ji bo dostên me baş dibe.

Sokrates fîlozofek Yunanî bi navûdeng e...

MAXO: (Bi dengekî nizm ku Sokrates nebihîse) Çî karê vî bi me heye. Fîlozof e, yan serê

xwe xwariye yan jî, li ser hesabê biyaniyan dixebite. Ne wisa ye heval?

REWŞENBÎR: Bawer nakim, rewşenbîrekî gelek giranbiha ye...

MAXO: Ji xwe ev hewesa we rewşenbîran li ser biyaniyan mal li me Kurdan şewitandiye,

ji bo hun ji bersiva wezîfeyên xwe birevin, hun xwe dispêrin felsefe, xwe li serê me zana

dihesibînin, nivîskar...

SOKRATES: Dengê we baş nayê min, ger hun dengê xwe hinek bilind bikin wê baş bibe.

REWŞENBÎR: Belê, heval Maxo, hun dikarin sohbeta xwe bidomînin.

SOKRATES: Em hîn li ser bersiva pirsgirêkan mabûn. Gelo mirov nikare bêje divê herkes li

ser beşa xwe bi awayekî xwe kûr bike, bibe pisporê karê xwe ku berjewendiya wî zêdetir

bibe?

MAXO: Rast e, divê wisa be, lê ka?

SOKRATES: Eger herkes di karê xwe de şareza be, ber bi pisporî biçe hin bersiv dernayên

holê? Çareseriya pirsgirêkan hin asantir nabe?

MAXO: Tu çi dibêjî, ma kî naxwaze wisa be. Lê bawer bike rewşenbîrên me ne di karê

xwe de ne jî, di karên din de tutişt nizanin, tiştên zanin jî, nakin.

SOKRATES: Çima nakin, yan jî, çi zanin û nakin?

MAXO: Ma mirov bixwaze çi nizane!

SOKRATES: Baş e. Em li ciyekî nêzîkê hev dibin: mirov bixwaze dikare fêr bibe, tiştên fêr

dibe jî, dikare bixe jiyanê...

MAXO: Rewşenbîrên me ne fêr dibin, ne dikevin jiyanê.

SOKRATES: Jiyana çawa?



MAXO: Jiyana xizmeta gel.

SOKRATES: Maxo, hun timî li der û dorê tiştan digerin, naxwazin pirsê binasin, nahêlin

mirov bersiv jî, bide.

MAXO: Ma bersivên we ji yên din ne pir pêştir in, hun jî, mîna rewşenbîran çareserî di gotinan de digerin..

SOKRATES: Gotin nebe çareserî nabe! Divê mirov berê plansaziya çareseriyê pirsgirêkan

derxe û paşê jî, li ser bifikire, ka wan çawa bixê jiyane. Hun ne bersiv didin, ne jî, dihêlin

em bersiv bidin.

MAXO: Ma bersivên hunê bidin çi ne? Ew jî ne gotin in, hun çi bibêjin ji bo min kêrê pênc

quruş nake, mesele pratîk e. Mesele jiyane e. Hun di jiyane de hebin baş e, wekî din heta

sibê hun bipeyivin jî, tu mane nade.

SEROK: Maxo!

MAXO: Belê, Serokê min.

SEROK: Tu nahêlî kes ramana xwe jî, bibêje.

MAXO: Em gelek demokrat in Serokê min, herkes dikare gotina xwe bibêje.

SEROK: Lê tu mîna şûrê Demokles li ser serê wan bî, kes nikare rehet ramana xwe bîne

ziman, ne wisa ye?

MAXO: Belê, wisa ye Serokê min, lê mirov rû dide wan, derdikevin ser serê mirov.

SEROK: Sebra te tune, tu guh bidî Sokrates, bawer nakim ku bi vî awayî demokrasiya te têr û

kêrî rewşenbîrên Kurdan bê. Divê em xwedî li hemû beşên gelê xwe derkevin. Rewşenbîr jî, beşek ji gelê Kurd in.

MAXO: Lê em rexne nekin, ew tu karî nakin...

SEROK: Rexne divê li ser bingeheke pêşvexistinî be, ne paş ve bikşîne.

REWŞENBÎR: Serokê min, heval birêz Maxo, gava rexne dike, xwe dixê ciyê we, şûrê we

digre destê xwe û li serê me dixê.

SEROK: Çawa? Kes nikare bi şûrê min li kesî bixê!

REWŞENBÎR: Pir caran kesên din, gava rexne dikin, xwe dispêrin bin perdeya rexnesîwanê

we. Gava kesek bi şûrê we şer dike, heqê şûrê we nikare bide. Ew şûr tenê di destê we de

xûrt e, bi tesîr e. Di destê kesên din de tesîreke ters şanî dide.

SOKRATES: Rast e. Herkes dikare bi şûrê xwe şer bike. Mînak, dema Iskenderê Zulqerne

şûrê xwe bigirta pir xurt bû. Tukes nikaribû bi şûrê wî şer bike. Rojek yek ji generalan wî

xwast bi şûrê wî şer bike, Iskender bi şûrê xwe serê generalê xwe jêkir

REWŞENBÎR: Bawer im Sokrates şaş fam kir, mebesta min bi şûr...

SEROK: Sokrates şaş fam nekir, hun jî, mîna Maxo nekin; wer dipeyive ku dibêje qey

Sokrates têngîje. Hun hîn Sokrates nas nakin, ew hertim meydana şer gelek fireh digre, heta

dijminê xwe tê de biwestîne û paşê wî serpişkî li erdê dixê. Hun û Maxo serpişkî li erdê

ne, lê haya we jê tune.

SOKRATES: Spas, ya rastî tu min ji min jî, çêtir zelal vedikî, tu min didî şermê; ez ji te pir

tişt hîn dibim.

SEROK: Qusura Maxo û Rewşenbîr mêze neke, dilê wan paqij e, lê serê wan tiştan dereng

digre. Ewê rojek peyva te ya îro fam bikin.

SOKRATES: Ez ji axaftina wan aciz nînim, lê dema me gelek teng bû, me gelek tişt bê

bersiv hîştin...

SEROK: Carekî din emê karibin hîn zelaltir bikin. Peyvên me, diyalogên me giş kin in, emê

rojek karibin dûr û dirêj baxivin.

SOKRATES: Hêvî dikim!

SEROK: Maxo, bi rexneyên xwe li ser rewşenbîran heqê wî hebe jî, riya rexneyên wî ne rast

e; mirovan direvîne, nêzîk nake. Rewşenbîr jî, pir mizmizok in, mezin nalîzin; em dixwazin

ew pir mezin bin.

SOKRATES: Gava rexne ji hêla te tî, bawer nakim ku kes jê aciz be. Mesele, divê herkes

hêz û sînoren xwe zanibe. Wer dibînim ku di vî warî de kêmasî hene.

SEROK: Derdê me jî, em dixwazin ev kêmasî ji holê rabin. Ev kêmasî nebin, rê ji mirovên

mîna Maxo re jî, tê girtin.

REWŞENBÎR: Hun peyvên gelek rast dikin!

SEROK: Ya şukur ku hun jî, hêdî hêdî têdigîjin û muhrê xwe lê dixin.

MAXO: Serokê min, ji xwe karê Rewşenbîrên me muhur li dest belê-na kirin e

SEROK: Karê te jî, xirabkirina navbera me û rewşenbîran e!

MAXO: Em dixwazin wan tevger bikin...

SEROK: Nekeve navbera me û xirab neke, bes e.

SOKRATES: Têkoşîna raman û mejî ji têkoşîna çekan diwartir e.

SEROK: Ger mirov baş pêk bîne.

SOKRATES: Belê, ger mirov baş pêk bîne!

Diyalog -VKarakterê

Kole û Têkçûyî

SOKRATES

DIBIX û

SEROK

SOKRATES: Roj bi roj kêfxweşiya min bilind dibe. Hertim hin Kurdên din dinasim û bi vî

awayî dikarim li ser Kurdan di serê xwe de hêdî hêdî wêneyek çêkim.

SEROK: Min digot qey hun Dibix dinasin!

SOKRATES: Na, yekemîncar e ku birêz Dibix dibînim. Min birêz Nalsrazob û birêz Maxo nas kiribû.

SEROK: Nalsrazob xwe pir mezin dibîne, li ser gelê Kurd mamoste dihesibîne lê haya gelê

Kurd ji wî tune. Maxo mirovekî nekêr bû lê me ji wî re gelek îmkanan vekir ku pêş ve biçe,

feyda wî bigîje gel. Rabû îmkanên me li dijî me xebitand, giş karên me yên girtibû ser xwe

têk bir û dawiyê çû li mala xwe rûnişt. Dibix saf e, niyetqenc e lê mînakek balkêş e ji bo

têkbirin û têkçûna rewşenbîriyê. Ew giş karê me tevlihev dike, nikare zebeş û xiyaran ji hev cuda bike.

DIBIX: Serokê min!..

SEROK: Dengê xwe biçek kêr derxî û hînî guhdariyê bibî ji bo te xirab nabe. Çi zanim tu

jî, sibê mîna Maxo nekî! Ma tu ji wî ne çêtir î.

SOKRATES: Birêz Dibix çî karî dike?

SEROK: Dest davêje her karî, lê tu karî jî, nabe serî. Xwe nivîskarek mezin dibîne lê heta

vêga tu berhemeke wî ya cidî tune. Xwe partîzan û polîtîkzan dihesibîne lê heta vêga çî karî

girtibe ser xwe nebiriye serî. Xwe pir xwedîqudret dibîne lê heta vêga me tu qudretên wî

nedîtine.

SOKRATES: Min xwast bizanim çî pîşe?

SEROK: Birêz Sokrates dixwazî bi Dibix re bipeyive, paşê ezê fikrê xwe bêjim.

SOKRATES: Birêz Dibix we xwe li ser çî kûr kiriye?

DIBIX: Mebesta we çî ye, hun dixwazin ez li ser çî agahdarî bidim we?

SOKRATES: Ez mirovek nezan im, hema hun li ser çî min ronî bikin, ezê ji we re spasdar

bim.

DIBIX: Hun bi çî serê xwe dêşînin, pîşeyê we çî ye?

SOKRATES: Ez bi xwe şagirtê herkesî me ku min li ser hin tiştan ronî bike.

DIBIX: Bêjin, hun çî bipirsin ezê bersiva we bidim. Ez bi xwe nivîskar im. Helbestan jî,

dinivîsînim, dixwînim, serê xwe bi fîlsofiyê dêşînim, ma hun zanin fîlosofî çî ye? Karên

siyasî, dîplomasî, zanistî dikim; carcaran jî, dem hebe şervanî dikim.

SOKRATES: Hun ji Xenophon zêdetir xwedî qudret in?

DIBIX: Dibêjin Xenophon jî, şervan bûye, nivîskar bûye, lê nizanim çawa bûye! Ma di

dema wî de mirovahî pir pêş nebû, bawer nakim ew pir tişt kiribe.

Agahdariyên we li ser

Xenophon hene?

SOKRATES: Hinek, xortekî jîr bû. Kesê yekemîncar li ser Kardoxan yanî Kurdan tişt

nivîsiye Xenophon e. Xenophon şervan û nivîskarek baş bû, hozanê gelê xwe bû.

DIBIX: Hozaniya min jî, ji ya pir hozanan ne kêmtir e. Ez bixwazim ji pir dengbêjan xweştir

distrêm, lê tembûr û keman nikarim lêxim, dixwazim fêr bim.

SOKRATES: Hozaniya ez qal dikim ne stranbêjî ye, lê hozanên stranbêjî jî, gelek hebûn. Ger

hozaniya we hebe, wê demê hun Rhapsodên Helenî baş dinasin. Min ji Sappho gelek hez

dikir. Gava qala wê dibe, dilê mirov bi êvînê tê dagirtin.

DIBIX: Rhapsode çî ye? Sappho kê ye?

SOKRATES: Rhapsode yanî hozan, dengbêj. Sappho hozaneke êvîniyê bû, gelek bi nav û

deng bû lê Pindar hîn bêtir dihat parastinê; ji ber ku Pindar pesna şervanî û lehengiyê dida.

DIBIX: Baş e, em dev ji kevnedem berdin, daxwaza we fêrbûna çî ye?

SOKRATES: Hun pir zû dîkin. We qala dema Xenophon kir, em li ser demê bipeyivîn. Paşê ez nikarim dev ji kevnedem berdim, ez hîn jî, di wê demê de dijîm. Baş e em li ser demê bipeyivin.

DIBIX: Çawa?

SOKRATES: Dem çi ye?

DIBIX: Dem dem e, yanî wext e, xeyo.

SOKRATES: Dem dem e, rast e lê eger dem dem be, tê wê maneyê ku dem ne dem e jî. Hun dikarin li ser wesfên demê rawestin?

DIBIX: Yanî çawa?

SOKRATES: Dem bi tam e, bi reng e, bi tevger e, bê tevger e, biçûk e, mezin e, kin e, dirêj e, şil e, ziwa ye, hişk e, nerm e, dûr e, nêzîk e, nizm e, bilind e ûwd.? Hun li ser demê çi difikirin

DIBIX: Yanî çi, hun dixwazin çi fêr bibin?

SOKRATES: Hun çi fêr bikin ji bo min baş e.

DIBIX: Binêre kalo, ez nizamim hun kê ne, lê wer dixuyê ku hîn haya we ji tevgera Kurd û welatparêziyê tune. Belkî hun nizanin gel kê ye, çi dike. Wisa dixuyê ku hun ji gel gelek dûr in û ji êşên wî bê xeber in...

SOKRATES: Em bêjin giş gotinên we rast in, lê çi têkiliya vê bi pirsên min heye?

DIBIX: Divê hun beriya her tiştî gel binasin, jiyana gel binasin, paşê dest bavêjin

fantaziyan, ka dem çî ye, nizanim çî...

SOKRATES: Rast e, lê we bersiva min neda.

DIBIX: Bersiva we, divê hun serê xwe bi pirsên gel bêşînin, ji ciyê xwe rabin xwe berdin

nav gel û serê xwe bi êşên wî bêşînin. Paşê pirsê demê bikin, bikevin xeyal û xewnên

rewşenbîriya tiraliyê.

SOKRATES: Spas. Lê ez dixwazim hun ji min re bêjin ka dem çî ye?

DIBIX: Ez ji we re çî bêjim bê feyde ye. Hun ji gel gelek dûr in. Ma min got: Dem dem e,

wext e. Hun saetê jî, nanasin. Li saetê binêrin hunê bizanin dem çî ye.

SOKRATES: Ez saetê dinasim lê dem û saet ji hev dûr in. Dem dem e lê ne dem e jî. Dem

saet e lê ne tenê saet e. Hun li ser pirsê welatparêzî, nêzîkbûna êşên gel radiwestin. Ev

tiştên hun dibêjin bi hezaran sal pêş bûn. Pir gel xwe berî bi sedan sal ji vê pirsgirêkê rizgar

kirine lê hun çima hîn li ser van tiştan radiwestin? Sedema ferbûna mina demê ji devê we

Kurdan ji bo min gelek girîng e. Gelo hun çima bi sedan sal paş xelkê li ser hin tiştan

radiwestin? Tê bîra min dema ez hîn dijiyam polîtîka we ya dewletî ji vêga pêş ve tir bû.

Gelek kesên sefera rojhilat dikirin ji hemû gelan bêtir qala we dikirin. Lê vêga di hebûna hêza

demê de navê we tune. Ev çend salên dawî dîsa qala we tê kirin, çima? Çima dem bi dem



bêdengiyek kûr li ser we heye? Çima vêga pirsar we dîsa xwe derxist pêş?  
Hun dikarin bêjin

pêwendiya van tiştan bi demê re nîne? Hun vêga du hezar û çar sed sal ji  
min dûr dijîn lê

em dîsa jî, dikarin bi hev re baxivin, çima?

DIBIX: Çawa?

SOKRATES: Ez beriya zayînê 399 sal hatim kuştin, hun 2395 sal şûn ve  
dijîn. Destpêka  
demê heye?

DIBIX: Belê, çawa tune? Ez ji axaftina we tişt fam nakim.

SOKRATES: Dem ji kuderê, kengê çawa dest pê dike? Eger dest pê dike  
berê wê ber bi

kuderê ye? Berê demê ber bi aliyekî be, ev çi alî ye? Aliyên demê hene?

Wesf û şeklên

demê hene?

DIBIX: Ma hun vê yekê jî nizanibin, ezê ji we re çi bêjim!

SOKRATES: Dawiya demê heye?

DIBIX: Divê hebe, li gor diyalektîkê destpêk û dawiya her tiştî heye.

SOKRATES: Dawiya demê li kuderê ye, kengê ye, çawa diqede? Dawiya  
demê dirêj e yan

kurt e? Li gor çi, çawa? Dûr û kûr ber bi kîjan aliyê ve dûr û kûr in? Dûriya  
demê, kûriya

demê bi çi tê pîvandin? Pîvan û dem di nav çi têkiliyê de ne? Dem zû ye  
yan hêdî ye? Li

gor çi mirov dikare kûr, dûr, zû û hêdibûna demê bipîve? Hebûn û  
tunebûna demê xwe bi çi

ispat dike? Dem hebûna çi ye? Hebûn xwe di demê de çawa diyar dike?

Rengê demê çi

ye? Hun dikarin demê bibînin yan bi dest, dev û hîsên xwe bigirin? Bingeh  
û navenda demê  
hene, hebin li kuderê ne? Maneya jiyânê di demê de çi ye? Di demê de  
jiyan heye yan jiyân  
di demê de heye? Dema jiyânê dirêj e yan jiyana demê dirêj e? Em dikarin  
bi hezaran pirsên  
din bikin, divê mirov li ser gotinan sivik raneweste, li ser bingeha wan  
raweste. Mirov nikare  
bersivên sivik bide. Pirs û bersivên sivik hene? Ji bo bersiva pirsên ku li  
me sivik dixuyên  
mirovahî çend sal bihurandine heta ku bersiv dane? Mirovahî çend sal  
bihurandiye heta  
pirsek bike ku li me giran neyê?  
DIBIX: Bi rastî tiştên hun qal dikin ji min re vala tîn, nebe tîkiliya we bi  
gel re gelek zeyif  
mabe, yan jî, hun gel hîç nas nakin?  
SOKRATES: Ez pir kêmtîşt dizanim, gel jî, kêmtînasim...  
DIBIX: Wê demê tîkiliya we bi welatparêzî jî, ne xurt e, dibe ku hun  
rewşenbîrekî gel jî,  
nebin?  
SOKRATES: Ez rewşenbîr nîn im. Tîkiliya min bi gelê Polis re xurt e, ji bo  
Polisê xwe şer  
dikim, diparêzim jî.  
DIBIX: Min dizanî, di we de nerastiyek heye. Hun tenê polîs gel dibînin û  
polîs diparêzin û  
hatine bi min re li ser tiştên vala mîna “dem çi ye” qise dikin!  
SEROK: Birêz Sokrates, ji kerema xwe bihêlin ez pê re piçek bipeyivim.  
Hun dikarin paşê

bidomînin. Hun çî bibêjin bêjin, ew guh nade we, tiştên hun dibêjin fam  
nake. Di serê wî de

hin şekil hene, xwe li gor wan şeklan dilivîne.

SOKRATES: Spas. Bawer im, ez û birêz Dibix ji zimanên hev fam nakin. Lê  
ger axaftina me

bidome emê hêdî hêdî hev nas bikin, zimanê hev fam bikin.

SEROK: Min ji te re gotibû: Kevir ji serê pir Kurdan nermtir e.

DIBIX: Rast e, li gundê me mirovek hebû...

SEROK: Serê wî mîna yê te hişk bû, ne?

DIBIX: Min dixwast bêjim...

SEROK: Bê deng be, guh bide min vêga. Tu çawa birêz Sokrates nas nakî,  
te me jî, nas

nedikir. Tu bi niyetekî baş nêzîkê tiştan bibî jî, nezaniya te li pêş te  
astengeke mezin e. Ne

wisa ye?

DIBIX: Belê Serokê min. Ez demeke ne zêde ye ku we dinasim.

SEROK: Belê, tê vêga bêyî ser demê. Birêz Sokrates jî, qala demê kiribû,  
lê te ji wî tişte

fam nekiribû. Polis ne polîsê tu dinasî, maneya wê bajar e. Polîs ji bo  
dema birêz Sokrates

dihat mana welat jî, kî bajarê xwe neparasta, ne welatparêz bû. Sokrates  
hem welatparêz hem

jî, mirovparêzekî mezin e. Piştî mirina wî bi 2395 sal jî, kes negihîştîya  
edeb û ehlaqê wî.

Ew mînakek balkêş e ji bo parastina prensîbên ehlaq û wîjdana  
mirovahiyê. Gelek dînên

samî di bin tesîra ehlaq û felsefeya birêz Sokrates û dema wî de mane.

Piştî mirina wî pir

komeşop (girûbên li ser rêya wî) ji bîr û baweriya wî derçûne. Ji van komeşopan yên herî

girîng Akademiya Platon, Stoa, Kynes, ûwd. bûne. Tesîra wan digîjin heta dema me.

DIBIX: Ez nizanibûm ew kî ye, bila li min bibuhre!

SEROK: Berî ku mirov yekî nas bike, divê li ser wî tiştek nebêje, rast e?

DIBIX: Rast e, min dixwast...

SEROK: Em vegerin ser me. We em nû nas kirine, çend sal in: Hun bawer dikin ku we em nas kirine?

DIBIX: Wê demê, têgîştina me li ser we kêmbû. Min digot qey hema çend tişt bizanim

bes e; vêga têdigîjim ku ne bes e. Ez di xwe de valahiyeke mezin dibînim.

SEROK: Bawer nakim te nas kiribim. Baş e, ji vê demê pê ve tê çi bikî? Tu di xwe de

qiwet dibînî ku tiştên baş bikî. Mîna tu dibînî dem pir girîng e, em diçin dizîvirin dîsa tên

ser demê lê em tucar nikarin demê zelal bikin, baş binasin. Paşê ezê te cardin bidim destên

birêz Sokrates daku demê bi te piçek be jî, bide famkirin. Em vegerin ser karê xwe: we me li

vir baş nas kir? Qiweta te ji bo meşa bi demê re heye? Em çawa dikarin te binasin? Tu

berê çawa bûyî, vêga çawa yî û tê ji vir şûn ve çawa bî?

DIBIX: Serokê min, beriya pênc salan bû ez ketim nav kar. Ez hinek perwerde bûm lê

têkilbûna min ne li ser bingeheke rast bû. Bi tesîra hin hevalan ketim kar; hin cangorî bûbûn li

ser min gelek tesîr kirin. Nêzîkiya min beriya pênc salan mîna vêga bûya,  
minê gavên pêş  
avêtiba.

SEROK: Eceb?

DIBIX: Bi vê nêzîkbûnê ketim nav xebat, teng mam. Di kar de pir nezan  
bûm, tenê bi niyeta  
baş nêzîk dibûm. Heval jî, pir alîkarî nedan min.

SEROK: Himm!

DIBIX: Hevalekî berpirsiyar te digot qey li dijî min bû, te digot qey ezê ciyê  
wî bigirim! Lê

hatina min ya cem we ber min ronî kir. Ez vê hatinê destpêkeke nû  
dihesibînim. Di jiyana

xwe ya nû de ezê jiyana we bingeh bigirim. Ez bi xwe bawer im û di dema  
pêş de bi roniya

nasîna vê jiyânê dixwazim bimeşim.

SEROK: Tu bi axaftina xwe re bi rastî jî, rast î? Te li ser vê bingehê biryar  
da?

DIBIX: Belê Serokê min.

SEROK: Em bêjin biryar heye lê zanebûn tune, we ji peyvên me yê fireh  
hin tişt girtin?

Berê şeklî bû, mîna pirtûkek; nav li ser heye lê giş rûpelên wê vala ne,  
yanî di bingeh de  
tişteke nîne.

DIBIX: Rast e Serokê min. Ez dikarim bêjim min jiyana û nirxepeyvên  
serokatî gelek baş

fam kir, pir di bin tesîra wan de mam.

SEROK: Berê jî te dinasî, tiştina digot, te vêga dît çiqas bêbingeh bûyî?

DIBIX: Ez dikarim vê bêjim ku Serokatî ji navê xwe û gotinên min sahkîrî jî, berz û mezintir

e.

SEROK: Mezintir e ha! Lê ne tenê mezin, kurtir e jî, ne? Û belayek mezin e di hundirê dilê

we hemûyan de. Hunê çawa ji bin rabin, tê çawa ji bin rabî?

DIBIX: Em mecbûr in Serokê min. Mehkûmê vî tiştî ne...

SEROK: Di jiyana te yê berê de giraniya Serokatî tunebû, pir sergerde bûyî ne?

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Ev tarzê keşmekêş ne yê serokatî ye. Te xwe tişteke dihesiband lê tu pêwendî bi

giranî tunebû. Bingeheke baş bavêje. Tiştên naverokvala ne giran e jî.

Dibe ku te hin

tiştan fikir lê tu ji bingeha rastî pir dûr bûyî.

DIBIX: Li vê derê têgihîştim ku salên derbasbûyî salên ketî bûn.

SEROK: Salên ketî, salên xew, salên bê bingeh. Teyê bi xebat serkeftin biafiranda. Hin

Kurdên ehmeq hene, gelek rewşenbîr heta gelek şervan wisa ne, tê jî, mîna wan bibûyayî.

Yek li serê çiya, yê din li Ewropa winda kiriye hîç ferq nake. Bêbingehbûna te rê nade

serkeftinê. Girîngî ew e ku tiştên mirov digire, dane ser xeteke rast û zana. Perwerdedor

mirov dixê nav erdhejiyê, diçirîne ber bi kar. Di te de jî, herhal ev çêbû.

DIBIX: Rast e, Serokê min.

SEROK: Ne wisa? Tu jî, hinek ketî nav erdhejiyê û çerxerast bûyî.

DIBIX: Demên ewil hinek ketim tengiyê. Bi daxwaza Serokatî hatim vê derê lê gava min

Serokatî dît, eleqe şanî min neda.

SEROK: Eleqe hebû lê xebera te jê tunebû. Ev jî, bêbingehiyeke din e. Em berê roj baş,

paşê çawa yî dibêjin.

DIBIX: Paşê fêr bûm, sedem pir baş têgihîştim.

SEROK: Tu edetê Kurdan dixwazî. Piçek xwedî şan û şohret î. Min bi zanistî “ çawa yî,

bi xêr hatî” negot. Ev usulek kevn û basît e, têgihîştineke baş ji bixêrhatinê nîne. Kesan

nayne ser bingeha rast, paş ve dixîne. Tiştê girîng ew e ku te vê fam kir.

DIBIX: Rast e, têgihîştim serokê min.

SEROK: Em dixwazin ji bo te jî, şa û bi hêvî bin. Lê mîna berê nabe. Em naxwazin bi

kemasî û nexweşiya te, ne em ne jî, tu xirab î. Tu jî, bibe xwedîtiştek. Bila nav, cî û

bingeha te hebe. Xwedîmeziniyek be. Ber bi meziniyê hin tiştan bimeşîne. Derfetên te

hene. Partî nabêje xwe bixapîne, em dixwazin tu jî, bibî tiştek. Em bawer in tu jî, vî tiştî

dixwazî, naxwazî ji xeta partiyê dûr bimînî.

DIBIX: Belê, Serokê min.

SEROK: Lê zanabûn û pêkanîn ji hev re pêwîst in. Ji vê şûn ve wê çî ji destê te bê. Saziya

tu jê hatiyê binêre, tijî kêmasî ne, dibînî?

DIBIX: Belê Serokê min, hertiştî dibînim.

SEROK: Dibe yê ji te neçê û ketî jî, tê de hebin; nikarin du gotina li hev bînin. Ez nabêjim ne durust in lê kar bi niyet nameşe. Xebata dîdebîneran ji hêla milyonan tê sêrkirin, ger her gotina te li ser wan tesîreke baş neke, tu kêrê pênc quruş nakî.

DIBIX: Gel pir li dij derket.

SEROK: Wer pir li dij derket ku min fedî kir, serê min êşiya. Xortek din heye, li dijî wê derketin hîn zêde ye. Ew xwe winda kiriye. Dêvla bername ji bo gel çêbike, xwe şanî dide.

Tu zanî em vê rewşê napejirînin. Ne ji bo xwe, divê ji milyonan çêbikî. Tu dibînî, ez xwe çawa deqîqe bi deqîqe ji bo gel dipîvim, bal didim ser daxwaz û rexneyan.

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Ew çi rewş bu tu ketibî nav. Te xwe maf kiribû.

DIBIX: Di destpêkê de kemasî wilo derketibûn. Ev ji bêtecrûbetî bûn Serokê min.

SEROK: Te digot “ji min hez dikin, min dipejirînin”; ev bingeha ramana te bû. Min berê ji

hin kesên din re gotibû: “divê tu ji xwe ne razî bî, ne êvîndarê xwe bî. Divê tu hertim

kêmasiyên xwe bibînî ku rastiya te bê famkirinê. Ev ji bo te diyalektîka jiyanê ye”. Ev gotin ji

bo te jî, derbas dibin. Xapînokpeyv jiyana derew e. Ez ji sedî yek jî, mîna te ji xwe ne razî me.

Tu bi vê rewşa xwe çawa dibî êvîndarê xwe, ji rewşa xwe kêfxweş dibî! Ez bi vê hêza



xwe heta derdikevim pêş gel û saetek dipeyivim, pir zor didim xwe, xwe  
pir dêşînim. Tu  
hîç zor nadî xwe, dibêjî “ji min razî ne”. Wisa nabe. Tu bi vî awayî berevajî  
nikarî pêş ve  
biçî, berz bibî. Kesên li welatên din karên mîna yên we dikin mîna  
generalan e, ji ber ku xwe  
baş pêş ve birine. Hun dixwazin bê ked bîn ser tiştên hazir. Baş bala xwe  
bidin karên  
xwe. Rewşa we mîna zaokan e, dibêjin “min vî cilê nû li xwe kir, ez xweşik  
bûm”. Rewşa  
te mîna rewşa keça 15 salî ye ku cilek li xwe dike, dibêje “ez çiqas xweşik  
bûm”. Qusurê  
mêze neke, ev ji bo rexne ye.

DIBIX: Belê Serokê min, mîna we anî ziman, kêmasiyên me yên mezin  
çêbûn

SEROK: Mirov bêbingeh, bêxem nagîje tu tiştî; mezinî divê tu bi xwe pêk  
bînî. Ger ez ji  
xwe razî bama, ezê ji zû ve rûniştibama. Min bigota “tiştên min çêkirî bes  
in, xweşik  
bûm”, rastejiyana gelê me nikaribû vî şerî bidomîne û bîne vê mistewayê.  
Van noqtan baş  
têdigîjî!

DIBIX: Pir baş têdigîjim Serokê min.

SEROK: Bawer im hin tiştan digirî. Tecrubeyên te jî, hene. Hêviya min, tu  
li ser van gotinên  
min bi balkêşî bisekinî û ji vî şûn ve, ji xwe re, rêyek rast û medotek hîn  
şoreşgertir  
bineqînî.

DIBIX: Ez bi xwe bawer im, Serokê min.

SEROK: Bi xwe bawer î, ne wisa?

DIBIX: Pir bawer im, Serokê min.

SEROK: Dikarî pêk bînî? Tecrubeyên we jî, ne kêmin. Wer difikirim ku tu tam bi biryar î.

Baş e, te ji dewrê wekî din çî girt? Vêga em jî, gotina te ya dawî guhdar bin.

DIBIX: Serokê min, li vê derê xebat û têtîlbûn çawa be, fêr bûm. Mirov çawa têtîldar be û

pêşengî bike... Mirov xwe ne bi xwe tenê sînor bike, çiqas pêş ve çû be jî, xwe têt

nebîne, xwe nexapîne; bi vê felsefeyê xwelivandin li vê derê fêr bûm.

Wekî din divê mirov

serkeftin bingeş bigire -dikarim bibêjim ku me berê tenê rojên xwe derbas dikir-, xwe bi

rojanejiyan sînor neke... Berê me roja xwe derbas dikir, digot: "me îro jî, bernama xwe anî cî,

sibe xudê mezin e."

SEROK: Bi vê tengnêrînê mezinbûn û birêveçûn mumkun e?

DIBIX: Li vê derê van kêmtêriyan hîn bûm, Serokê min. Iro bi sibê, sibê bi îro dibe.

SEROK: Ger tu bixwazî kurdayetî bi awaberz biafirînî, divê li ser her tiştî pir têtîz rawestî.

Xew nabe, bi pîneçavî nêrîn tê maneya windakirinê. Ew talûke hîn heye û berdewam e.

Herroj dibin bela serê min. Partîbûn fam nakin, serokatî fam nakin.

"Hertişt ji bo kêfa min

e" dibêjin. Ne mumkun e, tu dibînî ku ev agir e. Zagoneke partî ye.

DIBIX: Gelek cidî ye lê em bi cidiyeta ku Serokatî dida, nêzîkê kar nedibûn.

SEROK: Tabî ew xebata we bû. Hun mîna min cidî nêzîk nedibûn.

DIBIX: Nêzîkbûna me gelek bêbingeh bû.

SEROK: Nêzîkbûn tunebû. Bi ser de jî, we derfetên li pêş xwe çarçûr kir.

Kes çênedikir,

hevkarî û kolektîvîzm hîç tunebû.

DIBIX: Ji dêvla çêkirinê, em giş jê direviyan, panîkek hebû di nav me de.

SEROK: Ev nêzîkbûna dijmin e. Ger panîk hebû, ma di nav we de kontergerîla hebû? Ji xwe

tu birevî, ezê bêjim “ew kontergerîla bû”. Kontergerîla li kuderê, kî ye, zarokatî nekin.

DIBIX: Rast e Serokê min. Panîk tucar ne baş e. Rev îxanet e.

SEROK: Kesê bireve, tabî winda dike. Zarokatî nekin. Tiştên girîng, noqtên tu gihîştîyî ne

hindik in; di warê huner, di warê wêje, bawer im ji dewrê, te pir tişt girtin.

DIBIX: Belê Serokê min.

SEROK: Di warê wêje de li vê derê tiştê zêde li te tesîr kir, çi bû?

DIBIX: Serokatî neyê nasîn, şoreş neyê nasîn, şer neyê nasîn; ne mumkun e ku hîç

wextek wêje pêş ve biçe.

SEROK: Hun bi cewhera şoreşê teneğîjin, nikarin bibin wêjevan.

DIBIX: Cewherê wêje şoreş e.

SEROK: Ji şervan û şoreşvanekî zêde divê tu şoreşê nas bikî. Dibe ku gerîla polîtîka pir

kûr fam neke lê tu wêjevan î, divê tu vê yekê fam bikî. Xwîn çawa dirijê tu dizanî, ji

şervanek zêde van tiştan dizanî. Divê tu heqê wêje bidî.

DIBIX: Bawer im min ji hevalên ku ji mêj ve tevî refan bûne pir tişt girtin.  
Min jiyana

gerîlayan, jiyana cangoriyan û pratîka têkoşîna wan pirsî û fêr bûm. Ev ji  
bo min tiştên  
girîng in.

SEROK: Ne tenê jînetişt, gelek pirsetişt li ser mijara şer hene, divê tu hîn  
bibî. Tu

jînediyalektîka partiyê fêr nebî, nikarî wêje pêk bînî.

DIBIX: Li ser van bingehên taybetî wêjeya kurdî dikare pêş ve biçê. Wekî  
din pêşveçûna  
wê ne mumkun e.

SEROK: Ehmedê Xanî di civaka Kurd de ciyekî girîng digre, tê zanîn. Hin  
ristenirxên min di

derbareyê Ehmedê Xanî de çêbûn. Hin kesên ji xwe re dibêjin “wêjevan”  
gava ramana

Ehmedê Xanî li ser êvînê tînin ziman xwe ji naveroka wî dûr dixînin. Mîna  
zarokan e.

Bênasîna Ehmedê Xanî, çawa dikarin wî bidin nasandin, li ser wî raman  
diyar bikin. Diyar e  
ku ew dîrokê berovajî dikin.

DIBIX: Çawa yekî ku êvînê nas neke, nikare li ser evînê raman diyar bike;  
di derheqê

helbestvan û nivîskarekî mezin mîna Ehmedê Xanî de jî, ne mumkun e ku  
ew kes pirtûk  
binivîsînin.

SEROK: Helbet kesê êvînê nenase, ketina Kurd nenase, peçebûna Kurd  
nenase, jihevketina

Kurdistan jî, nizane; herwiha kesê dîrokê nizanibe, şer nizanibe nikare tutişt bîne cî.

Derketina nivîsên wiha nefam di bin navê wêjeyê de, bi navê wêjezanist bê şansê ye. Piranî ji

wan sextekar in. Ji ber vê yêkê em dibêjin xwe bi hêz bikin, berpirsiyarî di xwe de bibînin. Ji

vê şûn ve rola xwe bi vî awayî bilîzin. Kesên wejeya vê têkoşînê dinivîsin divê xwediyên

wê yên esasî bin. Divê kevnetaybetiyên kesayetiya Kurd ji holê rabin, dêvla wan nûtaybetî

bên danîn. Hun civak nas nakin, tutişt nas nakin. Mesela ez bixwazim dikarim ji we çêtir û

zêdetir pirtûkan binivîsînim. Ji xwe dinivîsînim jî. Her xebata min pirtûkek e. Ez li we

dinêrim, êş dikişînim. Civaka Kurd, malbata Kurd, kesayetiya Kurd, mêrê Kurd, jina Kurd

û pêwendiyên Kurd çawa ne, hun nizanin. Mirov derheqê tişteki ku nizanibe çawa dikare

binivîsîne. Romana Kurd; divê hun şerê Kurd, jiyana Kurd, mirina Kurd, ketina Kurd ji her

alî ve binasin ku derheqê wî de berhem biafirînin. Li Kurdistan gelek tîpên kifş hene, min

piranî ji wan vekirine, yanî ji bo wêjê jî, min gelek derfet pêşkêş kirine. Lê giyan pêwîst e.

Wêje vekirina wan e. Ronîkirina wan e. Kevnegiyan çi ye, nûgiyan çawa be! Giyana

teslîmiyet û giyana berxwedan neyê naskirin, roman nikare bê nivîsandin. Çi hez dike, çi

hez nake nizanibî, nikarî roman binivîsînî. Evîn çawa ye, kî vê dizane,  
maneya vê çi ye,  
nayê zanîn. Tu derneketibî berziya êvînê nikarî tiştê bikî. Buyera êvînê  
nenasî, nikarî  
roman binivîsînî. Tê xwe mîna zarokan bixapînî. Bi xwe êvîndarê xwe bî û  
bibêjî “ez pir baş  
im” dawiya te baş nabe. Divê ji vê şûn ve cidî bî. Madem dixwazî ji bo  
wêjeya kurdî hin  
tiştan bikî, wê demê guh bide van gotinên min. Wekî din nabe. Tiştên  
dervayê vê lîstik e.  
Tu rewşa wanên li Swêd, vê derê, wê derê dibînî. Mirov ji rewşa wan fedî  
dike. Goya wêje  
afirandine. Ne wêje ye, ne pirtûk e, teslîmbûn e. û herî girîng jî, mînakek  
bêgiyanî ya herî  
xirab e.

DIBIX: Mesela yek bi navê Nalsrazob heye. Pircar hat vexwandin lê nehat.  
Têkiliyên wî  
gelek teng in.

SEROK: Ew miriye. Ew di wêjeyê de rewşenbîrê mirî ye. Mumkun be li ser  
wî romanek  
binivîsîne. Ew êdî ne rewşenbîr e jî. Mirî ye.

DIBIX: Dijî-najî diyar nîne Serokê min.

SEROK: Kurdek çawa ye? Em Kurdê mirî bêjin, çi bêjin!

DIBIX: Serokê min, dixwaze navê xwe bi Mem û Zîn bijîne. Lê êdî kes bi  
wî jî, bawer nabe.

SEROK: Li ser Mem û Zîn herkes dikare şirove bike, lê bila ew neke,  
şirovekirina wî

heqaretek e li Mem û Zîn. Bawer nakim ku ew Mem û Zîn fam dike, ji ber ku di giyana wî de valahiyek heye.

DIBIX: Nirxandinên Serokatî di vê derbarê de li ser min gelek tesîr kirin.

SEROK: Dema min hebûya, karibûm bi we hunermendan re hîn bi awayekî din binirxanda.

Ger hun bixwazin bi rastî bigîjin kurahiyê, pêwîst e hun ji dil bawer bin. ...

Gune ye, heyf e;

kesên bê armanc tijî saziyan nekin. Xwedîderketina nirxan ev nîne. Bi nêzîkbûna serserîti,

bêdaxwaz, keyfî hunermendî nabe.

DIBIX: Serokê min, ji dêvla ku tewanên xwe pêş ve bibin, bi pêşîra hev girtine.

SEROK: Ev e şerma mezin. Em wan têr dikin, bi xwîn têr dikin. Layiqê vê nabin. Giş ev

tiştên tîn çêkirin tenê tîn maneya çîrkêfiyê. Vekirî dibêjim, kesên wiha bê çavgirîna

wan, emê biqewitînin. Me te ji bo xizmet girt vê derê. Ezê bala xwe bidim te. Ger tu kerê berê

bimînî, ezê te jî, biqewitînim. Vekirî dibêjim, pîvanên min hene, ger hun li gor wan nelivin,

divê hun bizanin kar wiha nameşe. Diya min ji bo min “hez nakim, qiymet nadim lê dîsa jî,

ezê giş mîrasê xwe li ser wî tapû bikim” gotiye. Çima? Ji ber ku li vê derê qiymetgirtin

heye. Zanibû ku ezê wan nirxan biparêzim, gotiye. Hurmeta herî mezin ji bo dayikan min

pêş ve xist. “Gava biçûk bû ecêb dihat ser min” gotiye diya min “ez nikaribûm wî bigrim bin kontrola xwe” ji hevalekî re gotiye. Tê li vê derê noqteyek fam bikî: Kesekî bi temenên biçûk li dijî diya xwe şer kiriye, eceb çi tîne serê min? Tu dizanî ez vêga ne zarokekî 7 salî me jî. Wê demê ne bi hêz bûm lê vêga gelek bi hêz im. Hîç demek evqas bi hêz nebûm. Divê tu vê yekê fam bikî. DIBIX: Rast e Serokê min. SEROK: Vêga xwedî hêz im. DIBIX: Ji vê şûn ve tukes nikare keda Serokatî înkâr bike. SEROK: Diya min dixwaze mal û mulkê xwe li ser min tapû bike. Ev ji bo xwe bide efkirinê ye lê têr nake. Ya girîng ew e ku mirov di riya welat, di riya şoreş û di riya mirovahiyê de bimeşe. Di vê riyê de bimeşî, rûmeta te heye. Ger nemeşî, paşê nebêje “min çêkir lê nedan min”. “Ez milîtan bûm, ew dîktator bû”; mesele ne milîtan û dîktatorî ye, mesela tu dikarî çêbikî yan na? Divê bi lehengî vê yekê bêjî. Tu xwediyê vî karî yî yan nînî, qiweta te heye yan nîne? Ev e mesele. Kesê ne leheng ez çawa mîna leheng bipejirînim. Mînak, çima ez qiymet didim Agît? Heval Agît baş tê bîra min; xwe bi her awayî perwerde kiribû. Wê demê D. jî, hebû; min demek bang li wan kir, anî pêş xwe. Heval Agît bi leza piling gihîşt



cem min, D. bi meşa xwe ya nîvnig pir bi şûn ve ma. Ev nîşana hin tiştan bû. Lezliv karê

kesên meşezexm e. Giranî jî, karê kesên ji her awayî paşvemanan e. Mîna tê zanîn, Dawud

li nîvê rê ma, ket. Ji ber ku nikaribû bi leza me berz be, ket. Lê Agît bi leza pilingekî meşê

bir encamê û gihîşt zîrweyê. Me li ser Agît hin tiştan nivîsand. Ev nîşana nirxdana me bû.

Ji ber ku heta nefesa xwe ya dawî bi me re bû. Tu jî, ger vê durustiyê û lehengiyê şanî bidî,

rûmeta te dibe. Ez rûmeta vala napejirînim. Mesela gava tu hatî vê derê, min ji te re negot “bi

xêr hatî”. Vê serokatiyê wiha binase. Serokatiyeke ecêb e. Qiweta te tunebe, dest navêje

rakirina talîmatên serokatî.

DIBIX: Ev giş ji bo min tecrube ne Serokê min.

SEROK: Ez her tiştî ji we re vekirî dibêjim, naxwazim kesî bixapînim. Gava tu talîmat

bigirî, pêwîst e bi giraniya wê têbigîjî. Ger tu carekî din guh nedî talîmatê min, li anegora kêfa

xwe hereket bikî, Mirovahiya te namîne. Ji ketiyan hîn ketî dibî.

DIBIX: Tucar xwedî bednîyet nebûm. Hertişt ji başnîyetiya min çêbû.

SEROK: Li vê derê tiştê girîng pratîk e, talîmat e. Talîmatên serokatî dîrokî ne. Xwe li gor

talîmeta nelivîn mirin e. Mirina miletekî ye. Ev kar li gor kêfa kesan nabe. Binêre, tu dibînî,

evqas ristenirxan çêdikim. Ev ji bo qedera miletekî ne. Van giş dibêjim ku girîngiya

talîmatan zelal bikim. Ger tiştêk tenê jî, ji bo şexsiyeta min be, vê yekê pozîtîf napejirînim.

Ger tu durust bî, welatparêz bî, bi partî re bî û bibêjî alîgirê xweşikiyê me, divê giş tewanên

xwe ji bo vê yekê bi kar bînin. Pêwîstiya xwelivîn li gor talîmatan heye, divê tu li gor van

pintan(noqte) xwe bilivînin.

DIBIX: Min li vê derê hertiştî fam kir.

SEROK: Jiyana tê çi maneyê, te fam kir? Paşê “min ji bîr kir, xwe da qisedanê” bêjî,

qiymeta te namîne. Ne tenê tu, em dibînin, hemû hunermendên ku li gor jiyana partiyê nikarin

bimeşin û direvin, gava demek şûn ve paş ve tên ji bo li xwe biborînin bi gotinên “hatim

xapandin, hatim xistin” guneh derdixin. Tê vê yekê terk bikî.

DIBIX: Tiştên min ji vê herêmê girtiye, ezê hewl bidim ku di pratîkê de pêk bînim Serokê

min.

SEROK: Bi van gotinên min, bi rastiya me tu dikarî mezin bibî. Wekî din mezinbûna te ne

mumkun e. Tiştên te girtin, bi jiyana xwe ve bikî yek û di pratîkê de pêk bînin, mezinî bi dest

bixî... Te ev hemû fam kirin vêga?

DIBIX: Gotinek Serokatî hat bîra min: “Serok bûn tîcareteke mezin e, dewlemendiyeke mezin

e”. Çiqas hebe, ewqas dewlemend dibe, ewqas berz dibe. Ev peyv ji bo min rê şanî didin.

SEROK: Ger tu ji bo xwe difikirî, em dikarin te bişînin gundê te. Em pêdiviyên te jî, temîn

dikin. Lê bi navê partî, bi navê serokatî bixwazî jiyana xwe bidomînî, li hember te zarok tune.

Çima ez zarok im? Dibe kesek min tişt nehesîbîne lê ez bawer im ku ez hêzek im.

DIBIX: Hêzek mezin Serokê min.

SEROK: Nizanim, lê madem ez hêzek im, çima tu li dijî min sekinî?

DIBIX: Nenasîn hebû Serokê min.

SEROK: Mîna min di mînaka diya xwe de da, hin taybetiyên serokatî hene. Ezê wan heta

nefesa xwe ya dawî biparêzim û pê ve girêdayî bimînim. Ez naxwazim barê we giran bikim.

Niyeta we baş e, hun durust in lê nizanin pêk bînin, dibe ku qiweta we tunebe! Lê ji dervayê

serkeftinê tu çareserî tune. Hertîşt ji me re dibêje “tê wiha bî, carekî din wiha bî”, hertîşt ji

me re dibêje “tê wiha derkevî ser, tê wiha şer bikî, wiha ber xwe bidî û wiha xweşik bî”. Ev

emirên dîrokî ne.

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Hat famkirinê?

DIBIX: Hat famkirinê Serokê min.

SEROK: Wekî din çî dibêjî?

DIBIX: Ez dikarim soz bidim ku ezê carekî din wiha nekim, Serokê min.

SEROK: Gumana min carekî din bi rûreşî dernekevî! Bi xwexapandinê carekî din dernekevî

pêş kesî:

DIBIX: Tucar Serokê min.

SEROK: Li pêş kî dibî bibe, biçûk-mezin ferq nake, tê hertim bi terza nêzîkbûn û cidiyeta

partî xwe bilivînî. Tê bi terz, lez û tempoya partî xwe bilivînî. Baş e?

DIBIX: Ji vê şûn ve bawer nakim ku astengiyek derkeve, Serokê min.

SEROK: Giranîtempoya te ya xebatê xwe diberiqîne ser giş jiyana te jî.

DIBIX: Di navbera hîapterza serokatî û ya me de ferqên mezin hene, Serokê min.

SEROK: Tabî, tu nikarî komî ser hev bikî. Ji xwe min vê netêriyê dît ji ber vê yêkê gazî te kir.

Ez ji dêvla we nîv saet bipeyivim, gel radibe ser xwe. Her peyvên te dive mîna gule bin, bi

mane û tama şekir bin. Xwe wiha bike. Ciyê hunê biçin, emê we bibînin; wê demê tiştin

hun dikin, ezê raxim ber çavên we daku hun kirinên xwe bibînin. Yê ne li ser rê, yê neçê,

yê rê nezan, ezê noqte bi noqte şanî we bidim. Ji bo hun giş van negatîviyan bibînin, ezê

hin dersna bidim we. Hun xwe mîna zarokan dibînin. Hun pir neçê ne le ji hev re dibêjin “ez

pir xweşik im”. Hin kesên nexweşik hene, xwe xweşikên dinyayê dibînin. Ew tucar

naxwazin rastiya xwe bibînin. Partî, tîpên wiha êvîndarê xwe qebûl nake. Partî, kesayetiyên

durust û bi rastî xwe fedayê gel kirine, dipejirîne. Ji ber vê yekê em dibêjin, ger hun nikarin

pêk bînin, derhal îstîfa xwe bidin. Ger rexne ji karên te ne, xwe parçe parçe û ji nû ve

biafirîne yan jî, îstîfa xwe bide, li ciyê xwe rûnê. Durustî ev e.

DIBIX: Rast e Serokê min. Berê lêgerîn û lêpîrsîneke wiha tunebû. Me hertişt li gor kêfa

xwe çêdikir.

SEROK: Ew mantik ne mantikê partî ye. Hun nikarin bi “ez çî bikim ji min re dimîne” re

sebra xwe bînin. Ev mantik mantikê axatî ye. Kesên dibêjin “ez ji herkesî xweşiktir im”

neçêyîya xwe vedişêrin. Terzê xebat û nêzîkbûna serokatî ne ev e. Ji xwe hîç ne razî ye.

Têkoşîna xweşîkayî dide, têkoşîna nûjînî dide. Yê girîng ne ew e ku tu tenê ji bo xwe

tiştan çêbikî, yê girîng ew e ku tu ji bo dora xwe, ji bo gel çêbikî.

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Baş, gotina dawî tu dikarî çî bibêjî?

DIBIX: Ez bawer im ku ezê girêdayî soza xwe bim. Kêmasiyên min hene, lê ji bo ku ez van

kêmasiyên xwe telafî bikim, ezê kedrêjîyeke sift sirf bikim. Ezê ristenirxên serokatî ji bo xwe

bingeh bigrim. Û ezê ji wan dersan derxim.

SEROK: Ne tenê dem bi dem, divê tu vê yekê roj bi roj îspat bikî.

DIBIX: Belê Serokê min. Ez bawer im, ezê netêriyên xwe telafî bikim.

SEROK: Em bawer in ku tê bi gotina xwe girêdayî bimînî. Tê, ji vî şûn ve, bi giş hêza xwe

pêş ve biçî. Wekî din, ne mumkun e, em te bipejirînin. Ne mumkun e tu jî, xwe bipejirînin.

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Xwe ji bo herêma şer jî, amade bike.

DIBIX: Ezê hewl bidim ku xwe amade bikim, Serokê min.

SEROK: Tu xwe ji şer re amade nekî, giyana te mirî ye. Gava em bang li te bikin, divê tu ji

bo şer amade bî.

DIBIX: Rast e Serokê min.

SEROK: Ev jî, prensîbek, madeyek partî ye.

DIBIX: Rastiya şer dizanim Serokê min.

SEROK: Baş e, soz bide û xwe li gor soza xwe bilivîne.

DIBIX: Soz didim ku ezê ji bo têkoşînê singa xwe bidim hember her zehmetiyê, Serokê min.

Ez soz bi navê jiyane didim.

SEROK: Birêz Sokrates, hun dikarin axaftina xwe bi Dibix re bidomînin.

SOKRATES: Piştî peyva we ji min re bi mane nayê ku bidomînim. We jiyana rast li ser

jiyana şaş derbas kir. Hêviya min dersên we di jiyane de bî famkirin.

Baweriya min bi

başiya mirov heye, başiya mirov dê li ser mirovê nebaş re derbas be.

SEROK: Hêviya min bi jiyane, jiyana mina bi hevî ye. Ez bi gotinên mirovan tenê bawer

dikim eger ew gotin xwe di jiyana mirov de bilivînin.

SOKRATES: Bê liv jiyane, bê lez dem nabe. Dem dilezîne eger lez bi demê re be. Hun hêviya

xwe didin ser demê yan demê didin ser jiyane?

SEROK: Ez hêviya xwe dikim jiyane di nav wê demê de ku hebûna xwe hîn ispat nekiriye.

SOKRATES: Dem bi lez e lê jiyane bi bez e, lê ez bawer im ku dem bê liv e di nav tevgera bi

lez de û ji lezê bêtir dibeze. Hun lez û meşa Kurdan li gor çi dipîvin? Lez û beza wan têrî

serfiraziya dema wan dike?

SEROK: Kurd di nav demê de bêdemiyê dijîn, çawa di jiyânê de miribin wisa jî jiyânê di

xwe de dikujin. Xebata me di hêviya serfiraziya xweşikiya tê de ye, têk neçe. Em berê

jiyanê ji mirinê vegeştin ser jiyânê, di jiyânê de mirin dimire.

SOKRATES: Mirin ne cewiyê jiyânê ye, hun çima rê didin ew bimire?

SEROK: Mirin bi hebûna xwe jiyânê dixê xeterê lê tunebûna wê jiyânê bê mane dike. Qiweta

tu kesî nagîje ku mirinê tune bike lê mirin di xwe de bimire nikare hukum li ser jiyana jiyânê

bike. Jiyana jiyânê ji bo mirina wê ye. Bê jiyana jiyana nikare bimire û bê mirin hukmê jiyânê dimire.

SOKRATES: Bê mirin jiyana, bê mirin mirin, bê jiyana mirin û bê jiyana jiyana nabe?

SEROK: Em dixwazin jiyânê bi mirinê bijînin. Bi mirina jiyânê mirinê bimirînin û mirinê li

ber jiyânê ji astengiyê derxînin. Jiyana xwe li mirinê bike xwedî, mirin nikare xwe li ber jiyânê

hilgire. Jiyana çiqas ji mirinê bireve, mirin ewqas dikeve pey jiyânê.

SOKRATES: Bê mirin jiyana, bê jiyana mirin nabe. Mirin hem mirin e hem jiyana e. Jiyana

çiqas dijî ewqas najî. Mirin çiqas dimire ewqas namire. Jiyana bê mirin e lê mirin bi jiyana e.

Mirin kûr e yan jiyana? Jiyana dirêj e yan mirin? Jiyana berê ye yan mirin?

SEROK: Dibix rabe, zû biçe, fîlosof kete nav efkareke kûr. Ew êdî me ferq nake! Tu ji wî ji xwe tutişt fam nakî.

SOKRATES: Jiyana bi çi tê pîvan? Mirin bi mêtire, bi elbik yan bi barê kerê tê pîvan? Baş ker zêde dijî yan mirov? Eger mirov ji kerê zêde dijî, wê demê ker zêde dimire yan mirov? Eger mirov ji kerê zêde dijî, ker bi aqil e yan mirov...?

Diyalog -VI-

Gelkujiya Almanya

SOKRATES

MacKANTHER û

SEROK

SOKRATES: Li gor min, mafê tukesî tune ku ji gelekî re, ji tevgereke azadî re bêje ew terorîst in. Bêje jî, bê mane ye.

SEROK: Dev ji gotina terorîst berde, jiyana gelekî, tevgerekê qedexe dikan...

SOKRATES: Çawa? Kî dikare jiyana gelek qedexe bike.

SEROK: Birêz Sokrates, ger hun bala xwe hinek bidin ser buyerên dawî, gelek tişt dibin ku tukes nikare ne tenê li ser xwe, li ser kesên din jî, bipejirîne. Birêz MacKanter berpirsiyarê dewleteke bi hêz e. Hêza dewleta xwe li dijî gelên bêhêz pêk tîne; alîkariya kesên bihêz dike.

SOKRATES: Ez MacKanter nas nakim, ew Kurd e yan çi mirov e?

SEROK: Alman e. Lê ji netewî be ne muhîm e, muhîm ew e ku kesên wiha ji mirovahiyê fam



nakin. Têghiştina wan ji mirovahî darê zorê ye, qiweta wan e.

SOKRATES: Çi karê vî camêrî bi Kurdan ketiye, camêr be tiştên wiha nake.

SEROK: Hun dikarin bi wî re baxivin û ji nêzîk ve binasin. Ew dijminiyeke tund li hember gelê me dajo.

SOKRATES: Birêz MacKanthar tu ji Kurdan çi dixwazî?

MacKANTHER: Ez ne li dijî wan im lê ew ji hedên xwe derbas dibin, mêvaniya xwe nizanin.

SOKRATES: Bawer nakim. Ger tu Xenophon yan jî, Minorosky ûyd. bixwînî, Kurd pir bi edeb, mêvanperwer û camêr tînin ziman.

MacKANTHER: Ew Kurdên berê bûn lê yên niha terorîst in, zerar didin mafê me.

SOKRATES: Çawa yên berê, niha jî, dostên minên Kurd yên zor baş hene.

MacKANTHER: Hin Kurd hene em ji wan gelek razî ne; bêdeng in, em çi bibêjin rast dibînin, dixwazin mîna me bikin. Tu zerar nadin mafê me.

SOKRATES: Ew çawa Kurd in ku giş gotinên we rast dibînin! Nebe têtîliya wan bi

Kurdan re tunebe? Ew kurdayetiya xwe bi çi diyar dîkin? Her gel bi rengê xwe diyar be dikare dostanî bi gelên din re ava bike.

SEROK: Kurdên me nikarin rengên gelê xwe diyar bikin.

MacKANTHER: Li welatê me rengê netewa Alman derbas dibe. Herkes rengê netewa xwe diyar bike anarşî çêdibe, mafê me zerar dibîne.

SOKRATES: Bi diyarkirina rengên netewek, çawa netewên din zerar dibînin? Ew welat hîn

rengîn û xweşiktir nabe.

MacKANTHER: Lê di diyarkirina rengê Kurdan de zerarên me gelek in.

Kurd têkiliyên me bi

dewletên dost re xirab dikin.

SOKRATES: Çawa?

MacKANTHER: Mînak, Kurd şerê xwe li Tirkiyê dikin em tişt nabêjin lê dixwazin li

Almanya jî şer bikin, têkiliyên me bi dewleta Tirk re kêr bikin.

SOKRATES: Em yek bi yek zelal bikin çêtir e. Berê mesela Kurdan. We got Kurd hene ku

mîna we dikin, ji gotina we dernayên.

MacKANTHER: Belê, ew Kurdên baş in.

SOKRATES: Hun çima alîkariya wan nakin daku ew bi ser bikevin û Kurdistanek mîna hun

dixwazin ava bikin?

MacKANTHER: Em naxwazin Kurdistanek ava bibe. Kurdistan ji bo me zerar e.

SOKRATES: We got Kurd gotina we dikin. Ji bo wan Kurdan ava bikin ku hun berjewendî jê

bibînin.

MacKANTHER: Hêzên wan nîne. Em pir dixwazin ew xurt bibin ku Kurdên terorîst kêr

bibin. Lê bê feyde ye, terorîst xurt dibin, ew nabin.

SOKRATES: Hun tu maf ji bo Kurdan layiq nabînin...

MacKANTHER: Çawa, em dixwazin lê têkiliyên me yên dewletî, navnetewî hene.

SOKRATES: We got Kurdên terorîst zêde dibin, yên baş nabin. Gelo ewên hun terorîst bi

nav dikin welatek, zimanek, alek, netewek naxwazin?

MacKANTHER: Dixwazin. Ala wan zerar dida me, me qedexe kir, daxwaza wana danîna

welatek em nikarin bipejirînin. Ji bo ziman û çand jî, em hin gavna dixwazin bavêjin lê tirs

me ew e ku ji vê yekê terorîst feyde bigirin.

SOKRATES: Hun ji aliyekê naxwazin şer bînîn welatê xwe, ji aliyê din jî, li ser Kurdan zilm

dikin. Ev ne mixrik e? Ger hun bixwazin Kurd şerê xwe neynin Almanya, çima hun mafê

nefsgirtinê nadin wan? Hun timê peyva terorîst tînin ziman, ji min re wer dixuyê ku hun giş

Kurdan wiha bi nav dikin. Ev xetere û şaşiyek nîne?

MacKANTHER: Hun Ewropê ne, hun ji çanda me ne birêz Sokrates, ji we re çî hun Kurdan diparêzin?

SOKRATES: Ez ne ji çanda we me. Çanda ez li ser pêl didim nivî ji Mezopotamya nivî ji

Misirê ye, ez bingeha xwe ji çandên giş gelan digirim. Hun me jî, dixwazin bikin şirikê

karê xwe lê pêwendiya me mîna hun difikirin ne xurt e. Di dîrokzanî û nirxandina kevnedem

de gelek kêmasî û nerastî hatine holê. Nerastiyeke herî ber bi çav jî, ew e ku têkiliya me û

Ewropa mîna têkiliya rojhilat ne xurt e. Hun hertim tiştên baş û xweş ji xwe re yên xirab ji

kesên din re dineqînin. Ez ji dîrokê gelek polîtîkvanên mîna we dinasim. Bawer im hun bi

hişkayî û polîtîka xwe ya rojane nikarin dema hun tê de dijîn jî, bi serkeftinî derbas bikin.

Heyf! Piştî bi hezaran sal li ser demokrasiya Athen derbas bûye jî, tu pêşketin nebûye. Hun hîn wê gotinê di devê xwe de dicûn û her diçe dirizînin û mirovahî jî, pê ve dirizê...

MacKANTHER: Min nexwast em bikevin nav gengêşiyeke kûr.

SOKRATES: Rast e, hun nikarin bikevin jî. Ez birêz Serok û gelê wî hin ji nêzîk ve dinasim,

daxwaza wan ji bo azadiyê dinasim û fam dikim. Hun bi hin termên qirêj dixwazin têkoşîna

vî gelî hêja û dîrokî winda bikin. Lê bizanin ku pir kes û dewletên xwedîtewan, ji we pir bi

hêztir vê daxwaziyê bi hezaran sal ne anîn cî; gelo wê temenê we, temenê dewleta we têr bike

ku hun vî gelî têk bibin, wiha kole zevt bikin?

MacKANTHER: Hun ajîtasyona terorîstan tekrar dikin birêz Sokrates, ne hedê min e we îkaz

bikim lê hun dikevin ser riya wan.

SOKRATES: Tabî ne hedê we û bavê we ye. Bavên we sêwiyên ber destê me bûn. Çi hedê

we ye hun me îkaz û îhtar bikin!

MacKANTHER: Birêz Sokrates hay ji gotina xwe hebin!

SOKRATES: Hun hay ji gotin û kirinên xwe hebin! Ez tucar wiha hêrs nebûbûm, niha we

emanetê birêz Serok dikim. Ez dixwazim berê hun pirsgirêkê hinek binirxînin, paşê ezê dîsa

vegerim ser axaftina xwe.

SEROK: Birêz Sokrates, tu dilê xwe hênik bigire, ev MacKanthar û hukumeta wî ji bo gelê

me ji dîroka nûjen biçûkdem in. Rûşeyên zû derçû ne. Wê mîna bayê derbas bin biçin.

Gelê me qedîm e.

SOKRATES: Rast e. Min ji mêj ve bi polîtîkvanên dewletfermî qise nekiribû, ez dibînim ku

rewş gelek xirab bûye. Dema me gelek pêşvetir bû.

SEROK: Pêşveçûna nûjendem ne raman û Mirovahî ye, piranî teknîkî ye. Hun dizanin

teknîk jî, kî bixwaze baş yan xirab dikare pêk bîne. Teknîk di destê dewletên dewlemend de

ye, li gor mafê xwe bi kar tînin. Em li dijî bikaranîna teknîkê nînîn lê li dijî bikaranîna wê ya

li dijî mirovahiyê ne.

SOKRATES: Baş e ku em di antîkdem de jiyane. Ez pir caran difikirîm ku nûjendem bi

teknîk û ronîleza xwe bigîje dema me baş e. Baş e ku mirovahî hîn negihîştîye konaxa

ronîlez. Wê bihatana bi teknîka xwe huzura me jî, birevandana...

MacKANTHER: Niha jî, nizanim hun qala çî dikin!

SEROK: Hunê hîç demek fam nekin, em qala çî dikin.

MacKANTHER: Rast e, zimanê me û terorîstan cuda ye.

SEROK: Tiştên em dikin terorîstî bin nebin, em ji we fêr bûne. Hun gelek tişt fêrî me dikin,

dixwazin bikin lê em naxwazin.

MacKANTHER: Niha ev ji kuderê derket, em terorîstî fêrî we dikin!

SEROK: Karxanên we hene?

MacKANTHER: Em di îndustrî de pir pêş ketine. Made in Germany li dinyê bi nav û deng

e, hun pê nehesiyane?

SEROK: Çawa! Em pê hesiyane. Piranî çekên dijminên me ji karxanên we derketine.

Teknîka mirin û kuştina gelê Kurd bi navê Made in Germany e. Em bi pêşketina teknîka we

bawer in. Ne ji teknîka çekên we bûya dewletên dostên we zû ve ji hev ketibûn, mafê gelê

me hatibû cî.

MacKANTHER: Em ji çekan bêtir makînen mezin çêdikin. Em tucar çekan nadin kesê ku

Kurdan yan jî, kesên din pê bikujin. Em hertim garantiya wê digrin ku li dijî sivîlan pêk neyê.

Ev îftîrayek e, ne rast e ku Kurd bi çekên me tînin kuştinê.

SEROK: Hun ne tenê çekên biçûk didin Tirkîyê, rast e. Hun tank, top, helîkopter, firoke

ûwd. makînen gelek mezin jî, didin. Ji xwe ew makînen we zora gelê me dibin, gelê me bi

wan makînen we tînin kuştin.

MacKANTHER: Di dinyayê de herkes tîcaretê dike, hun çima tenê me dibînin; em çek

nedin dewleta Tirk wê welatên din bidin. Bazar azad e, em mecbûr in malên xwe bifroşin.

Em nefroşin divê em karxanên xwe bigrin.

SEROK: Bazara azad heye, herkes dikare çekan bikire lê em bi çekên we dimirin. Hun

nefroşin, em dikarin zor bidin yê dinan jî. Hun ne tenê çek difroşin, hun alîkariya

dewleta Tirk jî, dikin.

MacKANTHER: Çawa? Em hîç alîkariya wan nakin.

SEROK: Hun polîs û tîmên taybetî perwerde dikin, hem li Almanya hem li Tirkîyê. Hun

pisporên xwe dişînin wê derê, qefle qefle tîmên taybetî perwerde dikin. Hun qefle qefle

tîmên taybetî tînin li Almanya perwerde dikin. Çima hun çavên xwe li van rastiyan

venakin? Ji ber ku mafê we di kuştina Kurdan de heye. Hun tîcareta xwe li ser kuştina

Kurdan ava dikin û gava Kurd li Almanya xwepêşandanek çêdikin hun hema polîsên xwe

dişînin ser wan. Hem li wan dixin, dixwazin meşa wan belav bikin hem jî, hema qala mafê

mêvanî û qanûnên sert dikin.

MacKANTHER: Kurd otobanên me dixetimînin, terorîstî dikin, pir fanatîk in.

SEROK: Mesela terorîstiya çî dikin, bi çavên we terorîstî çî ye?

MacKANTHER: Kurd fanatîk in, xwe dişewitînin...

SEROK: Edeba xwe bizanin, zimanê xwe dirêjî lehengî û cangoriya Kurdan nekin! Hun qala

otobanên xwe dikin, Kurd otobanên we dixetimînin... Hun nahêlin Kurd ji bo miriyên xwe

xwepêşandanek çêbikin. Malên Kurdan, gundên Kurdan, navçe û bajarên Kurdan, xweza

û heywanên Kurdan, daristanên wan, bi çekên we, bi alîkariya we  
dişewitin. Dê, bav,  
zarûzêç tên kuştin, keç û xortên çeleng tên kuştin; di van kuştinan de  
şopa Made in  
Germany eşkere dixuyê, gava Kurd li dijî van protesto dikin,  
xwepêşandanek li dar dixin,  
hun hîn bi ser de polîs û tîmên xwe yên herî tûj dişînin ser wan, nahêlin  
ew qêrîna xwe jî,  
bînin ziman. Bi ser de jî, hîn hun dibêjin Kurd terorîst in, fanatîk in.  
MacKANTHER: Mafên me yên dewletî girîng in, em rê nadin ku kes zerarê  
bigîjîne.  
Têkiliyên me yên navdewletî jî, ji bo me şert in, em naxwazin zerar  
bibînin. Kurd li  
Almanya mêvan in. Mafê mêvanan nîne ku rabin xwe li ser otobanan  
bişewitînin.  
SEROK: Hun pirsê hertim pir teng û biçûk digirin. Min qala şewitandin û  
xirabkirina  
Kurdistan, kuştina Kurdan kir. Çima hun li ser vê yekê tişt nabêjin. Divê  
em li ser van  
tiştan baxivin. Mirovek xwe bişewitîne, ev ne terorîstî ye, ew xwe feda  
dike. Lê çekdayîna  
dewleta Tirk, alîkariya perwerdeya leşkerî û encama van xirabkirina  
Kurdistan, kuştina  
Kurdan; ev e terorîstî. Hun welatê Kurdan dişewitînin, Kurd dixwazin  
meşek li welatê we  
bikin vê yekê protesto bikin, hun qala terorîstî û mafê mêvanî dikin. Hun  
Kurdan dikujin,



Kurd naxwazin bimrin, derdikevin ser cadeyan diqêrin, hun dibêjin ew fanatîk in, rêyên me dixetimînin. Hun pirsê hertim biçûk û basît dikin. Pirs ne ewqas sivik e. Hun çiqas zêde biqêrin, dengê we, dengê medya û çapemeniya we çiqas bilind be jî, nikarin ji neheqiyê bifilitin. Tecrubeyên we yên sedsalan jî, we ji rewşa rûreşiyê xilas nake. Ji bîr nekin, Kurd bi sebir in û dijminiya tu gelan nakin. Hun çiqas bîr ser me, rewşa rastî ji gelê Alman veşêrin jî, nikarin heta hetayî wiha bidomînin. Dengê gelê me nizm be jî, kêr be jî, hêdî hêdî digîje gelê Alman û gelên din.

MacKANTHER: Kurd hemû ne mîna we ne. Em bi we re têkilî çênakin. Kurdên baş hene. Emê bi wan re têkiliya xwe deynin. Hun zerar didin mafên me yên aborî û siyasî, em naxwazin ji rûyê we zerarê bibînin.

SEROK: Baş e, ev rewşeke polîtîk e, hun çima di bin navê qanûnan de dajon û dibêjin ku Kurd bêqanûnî dikin? Kurd bêqanûnî nakin. Hun zor didin huquqên xwe, bingeha qanûnên xwe qels dikin. Pirs polîtîk e, ne huquqî ye, hun çima qedexe di bin navê qanûnê de datînin. Em ji dîroka we zanin, tecrûbeyên we hene, hun bixwazin dikarin di nav demeke kin de giş huquq û qanûnên xwe, demokrasiya xwe bigrin bin lingan û mêvanên xwe yên Kurd bavêjin

derve yan ji holê rakin. Hun bi hêz in. Hêza we li ser teknîk, derew û demagojî ye. Hun qala Kurdên baş dikin; mîna birêz Sokrates anî ziman, hun çima alîkariya wan nakin, dibistan û derfet ji wan re venakin? Ji ber ku hun jî, baş dizanin, Kurdên we yên baş ji Kurdan gelek dûr in û tu têkilî û tesîra wan li ser Kurdan nîne. Hun ketine rewşeke wiha ku nikarin jê derkevin. Hêdî hêdî rewşa we xwe digîjîne rewşa dewleta Tirkiyê. MacKANTHER: Hun nikarin şerê xwe li ser xaka me bikin. Mesele li Tirkiyê ye, biçin li wê derê çareser bikin. Em rê nadin ku Almanya bibe ciyê şer. Emê di nav çarçova qanûnên xwe de rê nedin hun şerê xwe bînin welatê me. SEROK: Tu niyeta me tune ku em şer bînin Almanya nîne. Hun berî hertiştî alîkariya xwe ya Tirkiyê di bin çav re derbas bikin. Derd û kulên we em baş fam dikin. Bi gotina Kurdên baş hun dixwazin mesajan bidin me ku em xwe biguhirin, ramana xwe biguhirin, armanca xwe, şexsiyeta xwe biguhirin, lê ev xewn û xeyalek e ku hunê tucar nebînin. Em çawa bin wisa ne, mîna xwe ne, ger hun bixwazin pirsra Kurd çareser bibe dev ji Kurdan berdin, wan rehet bihêlin, alîkariya dijminên wan nekin. MacKANTHER: Kurd hertim sembolên qedexe şanî didin. Sembolên qedexe şanî nedin polîs hêrîş nabe ser wan. Divê hun hurmet ji qanûnên me re nîşan bidin.

SEROK: Ne hedê kesî ye ku simbolên Kurdan qedexe bike. Kurd bi salan e di bin simbolên xwe de şer dikin, ji bo simbolên xwe xwîna xwe dirjînin. Qanûnên simbolên gelan qedexe bikin ne hêjayê hurmetê ne. Ew ne qanûn in, biryarên polîtîk in. Bêguman hurmeta me, hurmeta gelê me ji gelên din re, ji qanûnên gelan re heye, lê ew qanûn jî, divê qanûn bin, ne mîna polîs û leşkeran bin. Huquq, polîs û leşker naşîne ser gelekî û paşê nabêje hurmeta me bigre. Gelê me hurmeta zordarî bigirta niha bûbû dîrok, li rûçkê dinyê nemabû. Dewleta Tirk, Ereb û Ecem jî, hertim gelê me bi bêqanûnî îtham kirine. Dewletek dest bavêje bêqanûniyê, pir zêde behsa qanûnan dike; hêviya min hun ji xeletiya xwe zû paş ve vegerin.

MacKANTHER: Ger hun bixwazin di nav aşîtiyê de bijîn, pêwîst e mîna me bikin, li dijî gotina me dernekevin. Helbet emê rojek fikra we bikin...

SOKRATES: Birêz MacKanter, bi rastî ez nizanibûm ku qanûnên we evqas bê adalet in. Hun bi vî awayî ne mafên xwe, hunê nikaribin qanûnên xwe jî, biparêzin. Ez vêga baş têdigîjim ku qanûnên we zordarî, mafên we gelkujî pêwîst dibînin.

SEROK: Birêz Sokrates ne hêja ye tu serê xwe bi van tiştan biwestînî; ez bawer im, MacKanter baş dizane ku ew neheq e, sîstema wan neheq e, lê parêzkerê wê sîstemê ye. Ew

dizane ku jiyana wî û ya pir kesên din rehet e, ji ber ku gelek kesên din dimirin. Ew jiyana

xwe û dewleta xwe li ser kuştina gelan ava kirine. Do Cihû bûn, îro Kurd in, kî dizane sibê kîjan gel e!

MacKANTHER: Huquqa me li dijî mafê we be jî, hun divê hurmet nîşan bidin...

SEROK: Yanî em hurmet nîşan bidin ku di kuştina me de mafê we heye!

MacKANTHER: Em we nakujin, pirsgirêka we ne bi me re ye, bi Tirkan re ye.

SOKRATES: Hun dostên dewleta Tirk in. Em ji dostaniya we re tişt nabêjin, li hev mibarek

bin, lê hun çima çek, tank, top didin wan, pere didin wan, tîmên taybetî perwerde dikin?

MacKANTHER: Na, em dewleteke huquq in; mafên me yên siyasî, navnetewî hene. Em mafê

xwe diparêzin. Heqê her dewletek heye ku parastina hebûna xwe, parastinê mafên xwe bixe

pêşiya hertiştî. Bila Kurd jî, mafê xwe biparêzin, me negotiye bila neparêzin; ger parastina

mafê wan zerar bide me, heqê me heye ku em qebûl nekin, li dijî rawestin.

SEROK: Pir baş, bi kêmayî hun hêdî hêdî hînê rastiye dibin birêz MacKanthar. Em jî, ji we

daxwaz dikin ku hun hertim wisa vekirî bipeyivin, xwe nespêrin paş huquq û qanûnan.

Mafên we yên aborî, siyasî, dewletî li pêş huquq û edaletê we ne; em dixwazin hun hertiştî

wisa vekirî deynin holê, berovajî nekin.

SOKRATES: Ez ecêbmayî me. Zimanê min nagere êdî tiştêkî din bibêjim.

Baş e ku ez û

MacKanthar ne hemdemê hev in. Bawer im wê di kuştina min de jî, tiliya vî camêrî hebûya.

Ji bo jiyana xwe yê qirêj bidomîne, ev camêr dikare hertiştî bike. Tu gotineke min ji wî re

nemaye birêz Serok; ez naxwazim di sohbeta namerdên gelkujan de zêde beşdar bimînim.

SEROK: Bîna xwe teng neke birêz Sokrates; tu bînfirêh û zanayekî berz î. Ez jî, heyf dibînim

ku tu gotinên xwe yê xweşik, demên xwe yê biha bi vî camêrî re derbas bikî. Min dixwast

tu carek binasî, ka kî dixwaze xwedî mîrasa we derkeve û bi wê mîrasê barbariya xwe

veşêre.

SOKRATES: Ez êşa Kurdan hîn bêtir fêr dibim. Heta Kurd bigîjin azadiyê, ezê xwe Kurd

bihesibînim. Ji îro pê ve ez jî, Kurd im û ezê li dijî barbariya ku maskeya demokrasiyê ji xwe

re dike perde tê bikoşim.

MacKANTHER: Ez bi guhên xwe bawer nabim. Birêz Sokrates dixwaze bibe terorîst...

SEROK: Hun nizanin ka wê hîn kî bibin terorîst; J.W. Goethe, K. Marx, F. Şiller, F.

Engels, H. Heine, R. Luxemburg, F. Nitsçe, K. Liebkneçt, A. Bebel, W.A. Mozart û bi

hezaran nivîskar û hunermendên Alman yê kevn û nû.

MacKANTHER: Ev tiştên hun dikin bê qanûnî ne. Hun nikarin van kesan hemû bixapînin, bigrin aliyê xwe!

SEROK: Qanûn ji bo we çi ye? Hun qanûn û rêkûpêk nafikirin. Mesele ew e ku mirov çi dike bike, di bin navê qanûnê de bike, neyê girtin; tiştên dike dizî bike. Emê qanûna xwe bi xwe çêbikin lê ne mîna we. Emê vekirî bikin: Maf, ne tenê li gor hêz û meziniyê ye. Emê nehêlin ku masiyên mezin masiyên biçûk daqurtînin. Di qanûnên we de gelkujî, bi zorê xwedîmafbûn heye, emê hewil bidin ku nekevin xeletiya we.

MacKANTHER: Min dixwast bêjim...

SEROK: Ji bo we kesên bêqanûniyên mezin dikin gerek neyên girtin. Ger bête girtin jî, roja din serbest in, lê kesên biçûk û jar tiştêk bikin, mîna kêçek têt perçiqandin. Huquqa we ne ji bo qelsan e, ji bo xwedîhêzan e. Alîkariya we hertim ji bo dewletên metîngeh e. Mirina mirovan astengî li ber firotina çekên we nake. Hun her diçe zêde çekên modern çêdikin û didin dewletên serdest. Ji bo we tenê tiştêk girîng e: Hauptsächlich die Kasse stimmt (Mesele kasa tijî be.)

Diyalog -VII-

Etîka Moral û Raman

SOKRATES

ISVANES, YASKO û

SEROK

SEROK: Birêz Sokrates, îro du mêvanên me yên hêja û zana li vê derê ne.

Hêviya min ew e

ku em bi hev re sohbeteke xweş bikin.

SOKRATES: Ez pir bextiyar dibim, gava hin mêvanên birêz, zanayên Kurd dibînim. Dilê min

xweş e ku ez carcaran bi Kurdên jîr re jî, sohbet dikim; ez bi xwe ji xwînmijên pozbilind

mîna MacKanthar pir aciz im û eger mafê Kurdan tê de nebînim bi kesên wisa re hîç sohbet

nakim.

SEROK: Xwînmij û gemar ciyê xwe di sergoya dîrokê de dibînin; dîrok kesên wisa ef nake.

Kesên mîna Meletos, Anîtos û Lîkon ku biryara kuştina te dan, îro di sergoya dîrokê de ne;

tu hîn bêtir bi heybet dijî. Dîrok ronahiya rastiyê ye, tariyê mahkum dike.

SOKRATES: Birêz Serok tu peyvên gelek xweş dikî. Peyvên te çiqas rast in!

Rastî carna di

jiyana mirov tê de ye zor e, nayê kişandin lê paşê ku mirov difikire, poşman nabe ku

tiştên rast kirine. Baweriya min ew e ku hin kes wê ciyê xwe di sergoyan de jî, nikaribin

bibînin.

SEROK: Rast e. Mirov vê yekê jî, ez bawer im pêwîst e bîne ziman ku hertişt bi du aliyan e;

welaw ku mirov carna aliyek bibîne aliyê din nebîne jî. Baş û xirabî jî wisa...

SOKRATES: Mirov baş li xirabî bikole, ji ber pêşderxistina başî eynik e. Tûj û kûr, tûj û

kor, tûj û şîrîn çiqas dijbertî bikin jî, yek tişt in. Newal berovajî bikî ji çiya dûr nakeve.

Mirov xwe ji ciyê xwe hîç tev nede jî, di saniyê de 30 kîlometir hereket dike, ji ber ku cîhan

li dora xwe û rojê dizîvire...

YASKO: Birêz Sokrates, birêz Serok hun pir kûr biçin, ez bi we re nikarim bigîjînim, ji

kerema xwe me jî, di nav sohbeta xwe de bi cî bikin!

SEROK: Bibuhrin, bi rastî em dixwazin bi hev re sohbet bikin, me ji nişka ve dest pê kir...

SOKRATES: Li me bibuhrin birêz Yasko û birêz Isvanes.

ISVANES: Na, hun tiştên girîng dibêjin. Hun bipeyvin, emê paşê ramana xwe bibêjin. Ne

wisa ye birêz Yasko?

YASKO: Belê. Lê em pêbigîjin çêtir e.

SEROK: Belê. Birêz Sokrates rast e: Mirov li ciyê xwe bisekine jî, di saniyê de 30 kilometir

hereket dike, lê ev hereket pasîv e. Mirov bi xwe nake, bi hereketeke mezin re kaş dibe, yanî

bê daxwaza xwe pê re ye...

SOKRATES: Bi daxwaza xwe mirov nikare ewqas zû bilive. Mînak mejiyê mirov bixwaze

dikare ji hereketa cîhan û rojê zûtir be. Lê her mejî vê zûbûnê ranake. Zû û hêdî jî, du aliyên ji

hev dûr û gelek nêzîk in, mirov dikare bibêje di nav hev de ne.



SEROK: Ferqa wan ne di hereket, di rawestana wan de ye. Em mînaka mejî bigrin; mejiyê bê

hereket mejiyê mirî ye. Hin mejî bê hereket dixuyên lê di nav wan de bahoz û bager dilivin.

Gava mirov li ronahiyê binêre tu hereket nabîne, lê leza ronahî di saniyê de 300 hezar

kîlometir zû ye. Ronîlez lezek e ku heta vêga jî, tu lez ji wê zûtir nîne. Li gor baweriya min

leza mejiyê ji ronîlez jî, hîn bi leztir e.

SOKRATES: Ger mirov rê li ber leza mejiyê negire, rast e. Mejî di lez de bê pîvan e. Kesên

leza mejiyê xwe hêdî dikin, ber lê digrin, xwe ji rizînê nikarin bifilîtînin.

SEROK: Belê, mînak hun ji ber ku di mejiyê xwe de zû ne û hertim di hereketa mejî de ne,

em dikarin di saniyê de 2400 sal bigîjin hev.

SOKRATES: Tenê hereketa mejiyê min têr nake. Pêwîst e du mejî di hereketê de bin daku

bigîjin hev. Di pêvejoka we de bi mîlyaran mirov dijîn lê ez bixwazim jî, bi wan re nikarim

bikevim têkiliyê. Hun bi mejîleza xwe digîjin dema min û demên pêşerojê; bi vî awayî

lihevhatin û lihevlivîn çêdibe.

YASKO (Ji Isvanes re): Bawer dikim emê ji vê sohbetê gelek feyde bigirin lê wê dora peyvê

kêm bê me.

ISVANES (ji Yasko re): Xem nake. Em baş guh bidin wan, sohbeteke zor balkêş e.

SOKRATES: Bibuhrin, me dîsa bê we berdewam kir. Belê birêz Yasko, rewşa we çawa

ye? Hun çawa ne birêz Isvanes?

YASKO: Rewşa me rewşa Kurdan e. Kurdbûn gelek zor e birêz Sokrates. Polîtîkvan,

nivîskar, rewşenbîrê Kurdan bûn hîn zortir e.

ISVANES: Birêz Sokrates, ger dema me bimîne ez dixwazim rewşa hin heval û dostan

bipirsim. Mesela Herakles, Thales çawa ne. Li ser Kurdan mefqufê wan çi ye?...

SOKRATES: Dem bimîne, ezê behsa wan jî, bikim; lê ew jî, pir meraq dikin ka hun çi dikin.

Ez dixwazim ji we pir agahdarî bibim. Herodot û Thukîdides pir silav dikin û dixwazin li ser

dîroka Kurdistan ya nû agahdarî bigrin. Jina min Xantippe jî, Kurdan pir meraq dike; hin

nivîsên we xwandine, pir bi kêfa wê ye. Pir silavên Europîdes li Mûsapos hene. Ez hêvî dikim

emê karibin rojek bi Musapos re jî, sohbet bikin!

SEROK: Belê, emê karibin. Mixabin Mûsapos vêga di nav gel de pir karên pratîk hilgirtiyê

ser xwe, em dikin nakin bernade nayê. Jiyana wî ji yên me gişî xweştir e, bi mejiyê xwe ji

hemû Kurdan azad û serbestir e. Ew ji we fîlozofan pir hez dike, dixwaze bê cem we.

SOKRATES: Thales ji min re behsa wî kiribû. Lê ew me kal dibîne. Rojek ji Platon re gotiyê

ew ji fîlozofên xort mîna Descartes, Rouşeau, Sartre, Kierkegaard, Şopenhauer, Nitsçe,

Marx ûwd. hez dike. Min ji Arîstoteles bihistibû ku navbera wan gelek baş e. Xenophon ji

wî pir hez dike, hertim behsa wî dike ji me re.

YASKO: Ma kî ji kekê Mûsapos hez nake. Dijmin jî, li hember wî hustîxwar e. Mûsapos di

dilê gelê Kurd de pîroziyek e. Rojek dema me hebe birêz Sokrates, ez dixwazim bi we re bêm

cem we daku giş agahdarî li ser Mûsapos bidim. Ez mîna kurê wî bûm, dostaniya me zêdeyî

30salan kişand; mirov ji wî têr nabe. Hun ji bo Platon çawa ne, Mûsapos jî, ji bo min wisa

ye.

SEROK: Giş wesfên rewşenbîrî û zanabûna Kurdî di wî de hebûn.

ISVANES: Ew ji bo me hemûyan mînakek e ku ehlaq û mirovahî çawa be!

SEROK: Bi vî awayî em dikarin dest bi sohbeta xwe bikin. Sohbeta me li ser hertişt e, lê em

dîsa jî, piçek bi sînor bikin çêtir e bi baweriya min. Li ser morala raman, ehlaqê mejî,

afirandina rewşenbîrî ûwd. em dikarin sohbet bikin.

SOKRATES: Bi vî awayî ezê karibim du ramanên bijarte ji civaka Kurd binasim.

YASKO: Haşa! Haşa birêz Sokrates tewecuha we ye. Em xizmetkarê gelê xwe ne. Heta ji

me bê, li gor zanabûn û qiweta xwe em dixwazin xizmetê bikin.

ISVANES: Birêz Sokrates gelek kîbar e, ne! Tabî birêz Serok ew mijara hun pêşniyaz dikin

gelek girîng e. Em îro li mêzêna êtîk yanî ehlaqê raman û mejî binêrin û  
rewşa Kurdan bidin  
ber çav, em dikarin kêr ked di vî warî de bibînin. Rewşenbîriya Kurd  
herçiqas mirovên  
mezin di dîrokê û di dema me de derxistibe jî, ev têr nake. Em Kurd bi  
morala ramana xwe  
neliviyane. Me hertim ehlaqê mejî ji bo dervayê xwe pêk aniye. Pêwîstî  
berî hezar sal bi vê  
yekê hebû, îro jî, heye.

YASKO: Kurdbûn zor e bavê min. Ehlaqê avakirina hin tiştan ji bo civaka  
xwe, di me de  
kêr e. Ji ber ku em hertim li gor êtîka berjewendiya mejiyê derva  
liviyane, me yê malê  
hesab nekirine; di parastina teng û mafên biçûk de mane, me nikariye ji  
bo xwe, ji xwe re  
bibin xwedî êtîka raman.

SEROK: Belê. Giş mesele ev e. Di dîroka mirovahî û şaristaniyê de Kurdên  
xwediyê êtîk  
yê mezin derketine. Kurd xizmeta mirovahiyê kirine. Lê îro ev xizmet bê  
xwedî ne. Çima?

Ji ber ku kes tune biparêze. Parastina wan ne bi navê wan e. Ger mirov  
bê nav be û bixwaze  
xizmeta navê cîhanê bike, di cîhanê de wê rûmeta mirov jî, bê nav be, bê  
xwedî be. Rastî ew e  
ku mirov li ser zemînek bilind bibe. Bilindiya bê zemîn berovajiya wî ye.  
Tu li ser rûmetek  
bilind nebî, nizanî berjor yan berjêr diçî. Nikarî wê ferqê jî, îdrak bikî.  
Kêmasiya êtîka

raman ne ji niyeta xirab yan ji bê ehlaqiyê tê, ji tunebûna zemîn, ji kêmasiya rûmeta der û dor

tê.

SOKRATES: Rast e. Mirov çiqas cîhanî be jî, divê zemînekî hebe ku mirov xwe li ser

bilivîne. Ev zemîn netew dibe, gel dibe, welat dibe, erdê herêmeke çandî dibe; lê bê civak

nabe. Civak mîna malbat e. Malbat mezin dibe, dibe civak, civak dibe gel ûwd. Bê pejirandin

û xwelivandina li gor van rastiyan mirov çiqas bixwaze jî, nikare bibe xwedîmoral.

SEROK: Mirov bi tena serê xwe li serê çiya be, ji mirov re ehlaqekî mirovî ne gerek e.

Mirov dikare tazî bigere, biqêre, birçî bimîne ûwd. Li wê derê ehlaqê xwezayî derbas dibe

ku ev qanûn e; qanûnên xwezayî.

ISVANES: Xebata me ya li ser êtîka ber bi ramana ji xwe derketî, ber bi xwe ji bo xwe û ji

derva anî ber bi xwe ji bo xwe, ji bo demeke ne dûr be jî, pêwîst e. Emê hewl bidin ku hîsên

me yên moralî û organî li ser gelê me bin. Kesayetiya berzedil ji bo dilberziya netewî ber bi

xizmeteke cîhanî ye. Xizmet ji xwe der berz bibe serfirazî ye.

YASKO: Heta ji min bê ezê guh bidim we daku baş têbigîjim. Ez ji fîlosofiyê zêde fam

nakim lê ji bo ramana xwe bînim ziman ezê jî, carcaran bipeyivim.

SOKRATES: Peyv bi serê xwe çi mane îfade dike? Ma peyv ji bo peyvê ye yan ji bo

têgîştina peyvê ye? Têgîştina peyvan ji peyv bi xwe mumkun e? Peyv ji xwe der, ber bi derva têgîştinê asan dike yan ji derva ber bi xwe? Li ba me hin fîlosof hebûn ferqa peyvên wan ji yê taciran nebûn. Ew hertim ji xwe der, ber bi xwe û ji der, ber bi xwe û bi xwe li ser xwe di rastiya têgîştina jiyânê de bûn. Rastiya wan di jiyânê de derewên jiyana rastiya wan bû. Hin fîlosof êtîk û morala raman ber bi mejî di mejiyê materî de didîtin lê di mejî û raman de materî nedidîtin û çîrûska êtîk ji raman ji bo wan mane îfade nedikir. Eger em qala raman bikin gelo ne pêwîst e ku em bingeha wî bînin ber çav; bingeha mejî em li ser çi ava bikin? Êtîk parçeyek ji hebûna materî ye yan na? SEROK: Êtîk mîna materî bê girtin xwe dide ser kîjan beşê organan? Mîna metafîzîk dervayê materî bê girtin îspata hebûna wî çi ye? Gelo em dikarin ji derva ber bi derva, ji hundir ber bi derva, ji derva ber bi hundir, ji hundir ber bi hundir yan jî, li derva bi serê xwe, li dervayê derva bi serê xwe qala rastiya-nerastiya êtîk, raman û moral bikin? Em dikarin ehlaq bi dest bigrin, bi çav bibînin; bi organên materî hîs bikin? Îspata hîsan ji derva mumkun e? Îspat nebûn bi xwe tê maneya îpatê yan îspata materî, îspata organan nayê maneya ne îspatbûnê?

SOKRATES: Xwenasîn îspata dervayê xwe nasîn e yan dervayê xwenasîn înkara xwe bi xwe

ye? Homer jiyaye nejiyaye bê îspat e lê dîsa jî, ne îspat e ku jiyana wî diyar e yan na. Jiyana

Homer mîna nejiyana wî ye ji ber ku bê îspat e. Ji ber ku nejiyana wî bê îspat e, ew jiyaye.

Homer kes bû yan gel bi xwe bû nayê zanîn. Tiştê tê zanîn, bi navê wî berhemên gelê Yonan

yên herî girîng hatine afirandin. Lê ev berhem çima girîng in? Girîngî mîna zewqên rengan

e, li gor herkesî, her gelî tê guhertin. Homer ji bo min girîng be jî, ji bo we ne girîng e;

pêwîstiya girîngiya wî jî tune.

YASKO: Homer ji bo min girîng e ji ber ku dîroka gelê Yonan e.

SOKRATES: Dîroka gelê Yonan çima ji bo te girîng e?

YASKO: Gelê Yonan gelekî xwedî kultureke bilind e, li ser rojhilat û rojava tesîr kiriye.

SOKRATES: Lê pirs ev e ka zêde tesîr kiriye yan zêde di bin tesîra wan de maye? Tesîr yek

alî nîne, hertim xwediyê du aliyan e. Yonan kultura xwe ji kuderê anîne ku didin rojhilat û

rojava? Gelek bi tena serê xwe dikare bibe xwediyê kultureke cîhanî yan cîhan hebûna xwe di

giş kulturen de nade xuyakirin?

ISVANES: Dîrok bi me dide zanîn ku kultura gelekî bi serê xwe nabe. Kultur hertim cîhanî

ye welew ew ji aliyê kesek jî, berepêş hatibe birin. Kultura Yonan kulturên din di nav xwe

de dîberiqîne lê welatên Ewropa tenê qala Yonan dîkin ji ber ku ew Yonan mîna xwe dibînin.

Ewropa dixwaze cehaleta xwe ya dema antîk bi kultura Yonan tijî bike. Lê Yonan bi xwe

înkâr nake ku ew bingeha kultura xwe piranî ji rojhilat û Afrîka girtiye.

YASKO: Yanî Ewropa derewan dike?

ISVANES: Mîrov nikare derew bêje lê înkâr û pozbilindî heye. Ewropa giş cîhana dervayê

xwe bê medeniyet dibîne; bi xwe ji kuderê xwediyê medeniyet bûye jî, nikare îspat bike.

Medeniyeta wî çi ye bi xwe nizane? Xwe davêje ser Yonan...

YASKO: Ewropî jî, mîna Tirkan dîkin?

ISVANES: Hîn bi aqiltir in. Ew ne bi înkâr, bi pejirandina tiştan naveroka wan vala dîkin.

YASKO: Yanî çawa?

ISVANES: Mînak tu îspat bikî ku Homer ne Yonan lê ji eşîra Hûhû bûye; ewê dest bavêjin

pesna eşîra Hûhû û di kesayetiya Homer de Hûhû mezin bikin. Paşê wê lêkolînan li ser

eşîra Hûhû bikin û îspat bikin ku Hûhû zêde xizmeta şaristaniyê nekirine.

Ji eşîra Hûhû

tenê Homer bi kultur mezin bûye û ew jî qala kultura Yonan kiriye. Bi vî awayî Homerê

Hûhû dîsa ji şaristaniya Ewropa bûye. Gelek metodên wan hene, ew bixwazin dikarin

pêwendiya her tiştên baş bi xwe ve girêdin.

SOKRATES: Ez ji vê yekê gelek aciz dibim. Ewropî hertim qala min dîkin û ji xwe



dihesibînin. Birêz Isvanes hun nikarin di dîrokê de îspatan bibînin ku tu pêwendiyên min bi

Ewropa re nebûne, ez ne ji kultura wan im?

ISVANES: Em dikarin bibêjin ku Sokrates ji eşîra Bêrtî ye lê ferqa me û Ewropiyên namîne;

em naxwazin mîna wan bikin. Derew û zanyarî ne dost in.

YASKO: Bi rastî hun ji eşîrekî Kurdan bana hîn xirabtir dibû; wê demê wê Tirk li we xwedî

derketana û hun ji wan xilas nedibûn. Li hember Ewropa hun dikarin hebûna xwe ya Yonanî

biparêzin, li hember Tirkan gelek zor e; ferqa we û Yunus Emre nedima. Baş ku hun ne

Kurd in birêz Sokrates.

SEROK: Henekên we gelek xweş in. Ger em cardin vegerin ser mijara xwe; eger di mejiyê

mirovê de valahî hebe, gelek zor e. Em vegerin ser rewşa Kurdan, heta dor bê Ewropa hîn

gelek dem dixwaze; em berê serên bê mejî li ba xwe binirxînin.

SOKRATES: Bawer bike li gor min mejiyê Ewropiyên herî bi aqil mîna mejiyê şivanê

gundekî we jî, nîne. Ez naxwazim di vê mijarê de kûr biçim lê ev ramana min e. Gava mirov

peyva mejî tîne ziman, aqil pê re difikire yan tenê organ tîne ziman?

YASKO: Helbet gava peyva mejî tîne ziman divê piçek jî aqil pê re mijara gotinê be, ev

ramana min e. Mejiyê bê aqil dibe yan aqil bê mejiyê organ dikare hebe?

ISVANES: Belê ev pirseke girîng e. Mirov pir caran ji yekî re dibêje aqil pê re nîne lê ev

nayê wê maneyê ku mejî pê re nîne. Em mejî mîna organ bigrin dest, nikarin tê de aqil

bibînin, lê mejî dest bi çalakiyan bike tê de tê dîtîn ka aqil heye yan na?

YASKO: Ma aqil bê mejî, mejî bê aqil dibe?

ISVANES: Helbet em nikarin hebûn û nebûna vê yekê îspat bikin lê em bi gotinan dilîzin,

dibêjin ev bi aqil e, ev bê aqil e ûwd. Lê nizamim aqil di kîjan mejiyê de heye!

YASKO: Mirov nikare aqil bibîne lê hîs dike, ji gotinan derdixe ka xwediyê gotinan di

rêzkirina hevokan de çiqas rast e.

ISVANES: Rêzkirina hevokan li gor çî rast e? Rastiya rêza wan bi çî tê pîvandî? Peyvên

rêzkirî ji yê nerêzkirî çima bi aqiltir tî dîtîn?

SEROK: Mirov bi tena serê xwe bijî, ji bo wî ev tiştên em tînin ziman, derbas nabin. Mînak

mirovêk bi xweza re bi tena serê xwe ye; ew çî bêje-nebêje, bike-neke ne çewt û rast e. Ji

bo ku em rengdêran (baş-xirab, çewt-rast ûwd.) bi kar bînin, hertim pîvan gerek e. Pîvan, li

gor civakan tê guhertin. Her civak ji xwe re pîvanan datîne û li ser wan pîvanan her kesên wê

civakê li hev tî. Ev lihevhatin ne peymanêke konstant (daîmî) e. Carna guhertin dikevin nav

van lihevhatinan.

SOKRATES: Em bêjin hin peymanên civakê hene û ez naxwazim van peymanan bînim cî,

xwe li dervayê wan dilivînim?

YASKO: Nabe birêz Sokrates, wê demê tu li gor peymanên civakê dikevî dervayê civakê.

SOKRATES: Ez li dervayê peymana civakê me û mîna wan nakim, ez peymana wan rast nabînim û xwe li gor xwe dilivînim?

SEROK: Belê, dikarî. Lê wê demê civak te qebûl nake. Dibe ku xwelivandina te ji peymana civakê bi mantiqtir be jî, dîsa dikevî dervayê civakê. Ji xwe pirsas me ew e ku çima em di nav peymanekê de dizên bê ku em wê dipejirînin. Peymanên xweza ne mîna peymanên civakê ne.

Xweza bi xwe xwe durust kiriye û tu xwe li gor jîtîna (înstîkt) tecrubeya mîlyon salan tê de rast dilivîni bê ku bizanî çima û çawa. Lê xwelivandin li gor peymana civakê piştî zayîni fêr dibî. Gava tu fêr dibî, dibî yek ji wê civakê. Xwe çiqas li hember civakê asê bikî jî, nikarî bi temamî jê xilas bikî.

SOKRATES: Ji ber ku ez xwe jê xilas nakim dibe ku li hember hin beşên wê derkevim, wê demê pêwîst e ku civak min bavêje dervayê xwe?

SEROK: Li vê derê pirsas mejî-aqil, ehlaq-raman derdikeve holê. Civak carek hîni qaîdeyek bibe bi sedan sal guhertin nabe. Her qaîdeyê ku civak fêr dibe ji nivşeyên pêşî tîn, mirov nikare di rojekê de li hember derkeve û qebûlkirina hemberderketina xwe bixwaze. Pircaran

edet û teqelîd yanî peymanên civak bi dem re dihelin, winda dibin, ciyê xwe didin hin

fêrbûnên nû lê ji bo vê yekê pîvan roleke mezin dilîze. Guhertina pîvan dibe sedem ku di

peymana civak de guhertin çêbe.

SOKRATES: Ji bo guhertina peymana civak pêwîstî bi guhertina pîvan heye? Baş e pîvan li

gor çî û çawa dikare bê guhertin? Guhertina pîvan bi çî girêdayî ye?

YASKO: Mirov nikare bi carekê ve civak qulopanî bike?

ISVANES: Tu civak bi carekê ve qulopanî bikî, ev dibe şoreş. Lê em bêjin te qulopanî kir,

hertişt guhert û çî? Tê çawa bimeşînî, alternatîvê te çî ye?

SEROK: Ev yeka pir girîng e! Bê alternatîvek rêkûpêk mirov nikare civak biguhire. Pirs

guhertina civak nîne, pirs alternatîv e. Pirs piştî guhertinê çî be ye. Eger tu xwe ji piştî

guhertinê re amade nekî, guhertina civak nayê cî, şoreş provake dibe. Divê mirov zanibe,

gelo ew piştî şoreşê çî dixwaze?

SOKRATES: Em bêjin mirov zane lê tenê bi zanebûn pirs piştî şoreşê çareser dibe?

SEROK: Na. Pêwîstî bi amadekirina piştî şoreşê heye. Divê mirov hîn di dema şoreşê

de mejiyên nû ji bo piştî şoreşê çêke. Mirovên nû; bi ehlaq, raman, giyan... Ji bo piştî

şoreşê xebat berî û di dema şoreşê de pêk neyê, paşê dereng dibe. Vêga em di nav

şoreşê de ne, hertişt bi heyecan dimeşe lê şerê germ bisekine, heyecan jî sar dibe. Ji bo

heyecan germ bimîne divê giyana mirovan bilind, dilê mirovan berz be, mirov ji berê zêdetir

xwedî êtîk bin, moralê wan bilind be. Ev taybetî fîdakarî di kesayetî de dixwazin. Xebata me

ya herî girîng kesayetiya nû ye.

SOKRATES: Tedbîrên pratîk çi ne? Jiyan çawa guhertina xwe bi dilberzî dikare bîne cî?

Mirovên nû kî ne? Ev mirov çawa ne, çi ne; hun çi didin wan, ew bi çi perwerde dibin?

Perwerdeya şoreşê ji bo piştî şoreşê çi ferqê dixê nav ya berê?

SEROK: Mirovên Kurd pêwendiya xwe bi koletiyê zû bi zû naşkîne. Bi sedsalan bindestî

fêkiyên tal gihîştandine. Em xeyalan nakin, em mirovên xwe civaka xwe baş nas dikin ji

ber vê yekê jî, xebata me piranî li ser kesayetî ye. Em dixwazin di kuştina kesayetiya kole

de, kesayetiya Kurd ya rastîn ava bikin. Kesên bi kesayetiya kevn nikarin di şoreşa me de

zêde bijîn. Em jiyanê şoreşê li ser dilberziya giyanê ava dikin, jiyanê kole ji vê yekê direve,

nayê jiyanê paqij. Paqijî jiyanê gemar dişo, tune dike; karakterên zeyif tê de winda dibin.

Em dibêjin, kêmbê jî, mirovên mezin, kesayetiyan dilberz, xwediyê moralê ehlakê bilind

pêwîst in. Xebata me li ser vê yekê ye.

SOKRATES: Hun ferqê dixin nav jiyana civak û pêşengên civak? Di jiyana pêşengan de zeyifî nabe lê qelsiya jiyane di civakan de derdikeve holê û ev jî, beşek ji jiyana wê ye, li ser vê yekê çî kar hene?

YASKO: Kekê Sokrates, birayê delal, bi rastî di civaka me de qelsî hene lê gelê me hewl dide ku qelsiyên xwe ber bi xurtî biqulibîne. Piranî qelsî ji me ne; ji pêşeng û rewşenbîrên Kurd in. Eger em karibin li gor jiyana nû, kesayetiya dilberz xwe bilivînin, gel amade ye, gel fîdakar e.

ISVANES: Belê, gelê Kurd pir fîdakar e. Dijmin bi gelê me pir lîstiyê lê dîsa jî, gel pir li ser xwe ye. Gelê me di şerê azadiyê de ye, li ser koletiya xwe şerê azadiyê dimeşîne. Li dijî koletiya xwe pir hişk e, ji bo azadiya xwe nerm e. Eger pêşengên gel karibin bibin berdevkên wî, baweriya min bi şoreşa me xurt e. Li ser civaka nû û peymanana civakê dixwazim bêjim ku giş pîvanên kolonyalîstan şaş in. Divê em giş pîvanên wan rakin, pîvanên xwe deynin.

SOKRATES: Di jiyana rojane de, piştî şoreşê peymanana we li gor çî pîvanê ye? Koletî, kolonyalîzm û kirinên wan tiştên xirab in; tiştên hun datînin çengkirinek e li ser van, lê

beriqîna wan di jiyana rojane de wê çawa be? Kurdên kole şer dikin ji bo azadiyê; ferqa

Kurdên azad ji ferqa Kurdên kole îro şer e, şoreş e, lê wê sibê piştî şoreşê çi be?

SEROK: Bersiva pirsê te naveroka şoreşa me ye. Ez azadiyê, serfiraziyê tenê di derketina

kolonyalîstan de nabînim. Kolonyalîzm tenê ne li ser xaka Kurdistan e. Kolonyalîzm di

mejiyê Kurdan de ye. Rizgarkirina xaka Kurdistan armancek ne dûr e, pirsgerêk rizgarkirina

mejiyê Kurdan e. Em di Kurdistanê azad û serfiraz de bi Kurdên mejîkole çi bikin?

Pirsgerêk ew e ku Kurd xwe bi xwe, kesayetiya xwe ji koletiyê azad bikin, serfiraziya mezin

jî, ev e. Em şer dikin û zanin emê xaka xwe ji destê dijmin derxin û Kurdistan ava bikin lê

avakirina Kurdistan bi koleyan nabe. Ji vêga de xebata me li ser serfiraziya kesayetiya Kurdan

e. Divê her Kurd li dijî xwe şer bike, kesayetiya xwe ya kole bikuje û ji nû ve ava bike. Ji

jiyana kole, mirina azad sed car bi şereftir e. Herkes nebêje ez azad im û kêmasî di yên din

de bibîne. Koletî daye heta qirikê, gemarî ji poz bihuriye û kesek ne li dervayê vê yekê ye.

Bila kes nebêje ez bi xwe azad im, heta ew civaka xwe bi xwe re azad neke, azadiya wî kêrî

tiştî nayê. Êtîka raman ji me azadiyeke giştî dixwaze. Nîv-azad, nîv-kole nabe. Nîv-ehlaq,

nîv-kesayetî nabe. Mafê kesî tune bi hinek-serfirazî kêfa xwe bîne.  
Serfirazî, azadî, kesayetî  
nîvcû nabe, ya heye, ya nîne. Azadî ne zebeş e mirov bi parçeyek razî be;  
ne nan e mirov  
gepek jê bigre; ne av e mirov dilopek vexwe. Heta mirov di azadiyê de  
nexenike, azad nabe.  
Serfirazî navêje ser serê mirov, gemarî paqij nabe.  
SOKRATES: Ez bi serfiraziya Kurdistan bawer im lê hêviya min kesayetiya  
kole wê di nav  
kolonyalîzmê de bixeniqe, nikaribe derbasî azadiyê bibe. Ciyê azadî lê  
hukumferma ye, koletî  
winda dibe. Di mejiyê mirovan de koletî pir e yan azadî? Aqil di mejî de  
hebe, rê dide koletî  
yan na? Aqil û koletî zêde bi hev re ne yan aqil û azadî?  
SEROK: Fêrbûna koletiyê hêsan e yan fêrbûna azadiyê zor e? Pîvana  
azadiyê yan pîvana  
koletiyê dirêj, kûr, nizm, bilind, dûr, nêzîk e?  
SOKRATES: Tama azadiyê şêrîn e yan koletî tûj e? Tuj şêrîn e yan şêrîn tûj  
e?  
YASKO: Birêz Serok û birêz Sokrates xwe kişandin nav ramana xwe, êdî  
dengê me nagîje  
wan.  
ISVANES: Bila be, baş e.  
SEROK: Kesayetiya qirêj heye, kesayetî dikare hebe û gemar be? Sed sal  
xwarin baş e yan  
rojek azad jiyân? Kurd pir in yan koletiya wan zêde ye? Kurdên kole kurd  
in yan ew tenê kole  
ne? Kurd û kole, mirov û kole dibe yan nabe?



SOKRATES: Sed kole pir in yan yek azad zêdetir e? Mafê koletiyê heye ku azad be yan

tiştê dikare hem kole hem azad be?

YASKO: Em biçin birêz Isvanes?

ISVANES: Na, em guh bidin efxarê wan

SOKRATES: Madem kole hene çima azad jî hene? Dinya zû dizîvire yan zû disekine?

Dinya heye yan tune ye? Ez ji kuderê zanim ku dinya heye, îspata min çi ye? Îspata min çi

ye ku ez heme, hebûna xwe bi çi dipîvim?

Diyalog -VIII-

Qatîlhezî

Çima Kurd ji qatîlên xwe hez dikin?

SOKRATES

ARZAN, ALABAN

ASIMQEND, BERKEND, TIRZO û

SEROK

SOKRATES: Çawa? Bi rastî ez hîç têngîjim!

SEROK: Rastiya me Kurdan ev e.

SOKRATES: Mirov çawa dikare ji qatîlê xwe hez bike?

SEROK: Têgîştina vî tîştî li me çiqas giran be jî, mixabin wisa ye; Kurd qatîlhez in. Bê

qatîlên xwe nikarin bijîn.

SOKRATES: Çima qatîlên Kurdan çawa ne? Çi didin Kurdan, ji wan çiqas hez dikin yan

jî, çi dikin ku Kurd ewqas ji wan hez dikin? Ez çiqas bixwazim baweriya xwe bi vê yekê

bînim jî, dîsa li min gelek giran tê...

SEROK: Li min gelek giran dihat û tê, ji ber vê yekê jî, bi salan e li hember şer dikim. Ez

naxwazim ji qatîlê Kurdan hez bikim; çi hezkirin, divê ew ji min quncik bi quncik birevin, nekevin destê min...

SOKRATES: Mumkun e ku Kurd fîlosofîk difikirin û ji vê hêlê xwe di nav pêwîstiya

hezkirina qatîlê xwe de dibînin! Belkî ew ne hez e, nefret e!

SEROK: Çi fîlosofîk! Kurd ji rebenî û bêçaretîyê ketine vê rewşê; ji pepûktiya wan tê ku

ji dijminê xwe hez dikin. Hez çi, ew êvîndarê dijiminê xwe ne. Di nav êvîneke kûr de ne. Tu

nikarî ji dijminên wan re tiştêk bibêjî, diqehirin. Dijminên Kurdan ne mîna dijminên xelkê

ne, gelek dijwar in, bi barbariya xwe dijwar in. Ewçend zor û zulum li Kurdan kirine ku

rêyeke din ji bilî qatîlhezî ji wan re nehîştine. Sedem zelal e, lê serhilnedan ne zelal e. Divê

ew li dijî vê yekê bîn hişyarkirin.

SOKRATES: Divê mirov vê yekê zelal bike. Meraqa min li ser Kurdan her diçe zêde dibe.

Ez êdî nikarim bê pirs û ramana Kurdan jiyaneke bifikirim. Eger nikarim jiyaneke bê wan

bifikirim, divê têkiliya xwe hîn xurtir bikim. Ezê bi hin nasên xwe re jî, li ser qatîlhezî

bipeyivim ka ew çi difikirin. Nizanim li welatê Helen qatîlhezî heye yan tune, ezê ji giş

nasên xwe bipirsim daku agahdariya min li ser vê yekê çêbe. Lê ez bawer im ku ger

Diogenesê Sînopî vê yekê bibihîse wê gelek kêfa wî bê. Ew hertim li pey tiştên ecêb digere.

Ez jê re qala vî tiştî bikim, belkî ew biçe Kurdistan, cem Kurdan û bixwaze bi wan re bijî.

SEROK: Berî ku tu bi Helenan re bipeyivî, dikarî bi hin Kurdan re derbarê vê yekê bipeyivî,

agahdariya xwe fireh bikî. Va Kurdên ji her aliyê Kurdistan jî, ber bi me tîn, kerem bike, em

bi wan re sohbet bikin. Belê, binêre ev birêz ARZAN e, yê li cem wî ALABAN e, her du jî, ji

başûr in. Evê li ser milê me yê rastê ASIMQEND e, ji rojhilat. Yê ku di navbera wan de ye

BERKEND e, ji bakûr. Ewê serê xwe dixurîne TIRZO ye, Kurdê Ewropa ye. Kesên din

nehatine.

SOKRATES: Birêz Arzan li min bibore ku ez tiştan zû bi zû tînegîjim, hin pirsên min hene

ji bo ku ji min re zelalî çêbe...

ARZAN: Belê keremke, lê mafê tu kesî tune ku dev bavêje dostên me û navbera me xirab

bike. Em tucaran rê nadin vê yekê, ne wisa ye birêz Alaban?

ALABAN: Çi ji destê me bê, emê bi cî bînin daku dostaniya me bi dijminên me re têk

neçe. Dibe ku em di hîç tu tiştî de li hev nekin lê di vê yekê de fikrê me bi birêz Arzan re

her tim yek e.

SOKRATES: Min hîç tutişt ji we fam nekir birêz Arzan û Alaban! Eger fikrê we yek e, hun

çima û çawa du kes in. Eger hun du kes in û ne bi hev re ne, çawa fikrê we yek e?

ASIMQEND: Mafê me heye ku em bi herkesê re, ji bo pêşvebirina têkoşîna xwe têkilî

deynin. Dost û dijmin ferq nake, dîplomasî pêwîst e. Dîplomasî di têkiliyan de dost û dijmin ji

hev cuda nake.

SOKRATES: Min dixwast bizanim...

BERKEND: Em tucar naxwazin dewleteke me ya serbixwe hebe. Em dixwazin bi dijminên

xwe yê dost, bi hev re bijîn; xem nake bila dewlet ya wan be, emê jî, li ber destê wan bijîn.

Ma mirovahî miriye!

TIRZO: Ma gelo em Kurd kengê dibin mirov, derdikevin nav mirovan. Ez fedî dikim bi

dostên xwe re qala Kurdên me bikim, ew li me bi çavekê gelê natûrel, yanî bê medeniyet

mêze dikin. Heqê wan jî heye, em hîn nikarin bi der û dorên xwe re bijîn, emê çawa bi

Ewropa re li hev bikin. Ew dirindeyî ku tifing digrin destê xwe û diçin ser çiya îmajek ne

baş li ser me dide xuyakirin. Ez tucaran vê yekê napejirînim. Divê em li hember hîçkesî

destê xwe ranekin, tişt nabe, bila ew li me bixin, ma ew jî, ne mirov in; divê em mafê

mirovan biparêzin, ger ew li rûyekî me bixin, divê em rûyê xwe yê din bixin bin şemaqên

wan. Bila kes nebêje em dirinde ne, ya rastî em Kurd mirovhez in û herî zêde jî, em ji qatîlên

xwe hez dikin. Ev jî, tiştêkî suruştî ye, humanîzm e...

SOKRATES: Ez tutişt fam nakim. Hîn min tu pirs nekirine, bersivên ecêb digirim. Ez

nizanim çi bipirsim.

SEROK: Tişt nabe. Tu dikarî bi pirsên xwe bidomînî. Tu çi dipirsî bipirse, bersivên wan ji

berê ve hazir in, ewê mîna xwe bersivan bidin. Lê demek şûn ve di nav sohbetê de tê karibî

hin bersivan bibînî.

SOKRATES: Kesek dikare ji min re ronî bike, sedema qatîlhezîya we çi ye? Eger hun jê hez

dikin, ew çima dijmin e, eger ew dijmin e hun çima jê hez dikin?

ARZAN, ALABAN, ASIMQEND, BERKEND, TIRZO (gîş bi hev re): Na, ne rast e.

SOKRATES: Çi ne rast e?

ARZAN: Ew ne dijminên me ne. Em ji wan gelek dilxweş in.

ALABAN: Em bê wan nikarin, qiweta me nîne.

ASIMQEND: Ew nebin kes bi me re diplomasî nake.

BERKEND: Em bê wan çi bikin ji Kurd û Kurdistan.

TIRZO: Em humanîst in. Maneya humanîzm mirovhezî ye. Heta niha tukes li ser humanîzmê

tiştêkî rast negotiye, ezê hewl bidim ku ronî bikim ka ev çi ye! Mîna birêz Napoleon dibêje:

pere, pere, pere!

SOKRATES: Baş e, yek bi yek em tiştan zelal bikin. Birêz Arzan hun dikarin rastiya vî

tiştî; eger nebe nerastiya vî tiştî; eger nebe çewtî û neçewtî; eger nebe zelaliya rewşê ji

me re ronî bikin, eger hun nikarin ronî bikin, tarîbûn çî ye, şanî me bidin?

ARZAN: Ez bi xwe pir tişt li ser vê yekê nizanim. Tenê eger ez sozek bidim li ser soza xwe

disekinim lê birêz Alaban di vê rewşê de pisporek û mamosteyê me ye, dibe ku ew bersivên

pirsên we bide.

ALABAN: Haşa! Hun hostayê min in, ez di dibistana we de mezin bûme.

Birêz Serok jî, li

vir e, emê rastiyeke bînin ziman. Mesele gelek asan e lê hin kes naxwazin têbigîjin. Em

polîtîkvan in, polîtîkvan çî dikin; polîtîka. Em jî, ji kesî hez nakin, êvîndarê kesekî nînin, em

polîtîka û dîplomasî dikin. Di polîtîka û dîplomasî de qatîlhezî hebe, emê wî jî bikin. Çî

lazim be, emê bikin. Polîtîka û dîplomasî li gor dilê mirov nameşe; wê demê divê dil û

daxwaza mirov li gor wan xwe bilivîne.

SOKRATES: Gelo polîtîka û dîplomasî rê didin qatîlhezî? Mirov moralê gelê xwe hesab bike

yan na? Moralê gelê mirov rê dide êvîndariya qatîlhezî yan na? Çima mirov naçe nav gel

û hertiştî vekirî çênake?

ASIMQEND: Birêz Sokrates hun dijminên me nas nakin...

SOKRATES: Çima nas bikim! Ez naxwazim dijminê Kurdan, ez dixwazim gelê Kurd baş

nas bikim. Gelo gelê Kurd qatîlhezî dipejirîne?...

BERKEND: Ma gelê me hez neke, em çima bikin. Gel reben e, perîşan e, nizane ji çi hez

dike, ji çi nake. Pêwîst e em rê şanî gelê xwe bidin.

SOKRATES: Rêyeke din ji bilî qatîlhezî tune, mirov nikare dijminê gel pê baş bide

naskirin? Gelê Kurd dijmin nas bike, ne çêtir e?

ARZAN: Na, mafê me di vî tiştî de nîne.

ALABAN: Gelê me dijmin baş binase, em nikarin diplomasiî bikin...

ASIMQEND: Gel ji polîtîka dûr bimîne çêtir e. Hun dizanin em dîplomasiya dizî dimeşînin

û xetere pir in; ji bo gelê me di rêya dîplomasiya dizî de têk neçe, nizanibe çêtir e. Yê

dizanin piranî têt kuştin, dijmin xurt e. Divê em di vê rêyê de têk biçin lê gelê xwe

biparêzin.

BERKEND: Pirsgirêk ew e ku em gelê xwe, gelê me jî dijminê xwe baş nas nake. Divê em

dijmin bi gel bidin naskirin daku gel bibîne dijminê me ne ewçend xirab e û dev ji şer

berde, pê re bijî.

TIRZO: Ya rastî pirs gelek zelal e. Divê em rêyek bibînin ku gelê me giş bê Ewropa. Li

Ewropa tişt nayê serê gel ji ber ku demokrasî heye, mafê mirovan heye, çi zanim... heye û

heye. Eger em nikarin gel bînin Ewropa, pêwîst e em Ewropa bibin Kurdistan.

SOKRATES: Ma li Ewropa çi heye? Mîna birêz Serok ji min re gotibû, ew çek û top

difroşin dijminên Kurdan, çima ew ji bo Kurdan baş bin? Demeke berê em bi

berpirsiyarekî wan re, bi MacKanter re, peyivîn, ew mafê Ewropa di kuştina Kurdan de

didît, îcar tê çima Kurd bibî Ewropa yan Ewropa binî Kurdistan?

ARZAN: Birêz MacKanter destekî me yê herî hêja ye.

ALABAN: Eger birêz MacKanter û yên mîna wî nebûna wê Kurd hîn bi çekên îptidaî

bihatana kuştin. Ew çekên humanîst didin dostên me yên dijmin ku Kurd bê êş û êşkence

bên kuştin. Ev yek jî, şanî me dide ku ew çiqas humanîst in, can bi gorî ji dijminên wiha

re.

ASIMQEND: Di vê yekê de ez bi we re ne di eynî fikrê de me. Saddam qatîlekî hov e; ne tenê

bi çekên kîmîkî, bi her awayî Kurdan dikuje.

ARZAN: Birêz Asimqend hun biçin serê xwe bi dijminên xwe re bêşînin, çima dev

davêjin dijminên me. Me tucar tiştêkî xirab li ser dijminên we gotiye; na. Em hertim bi

dijminên we re di nav xebateke baş de ne û mîna bira ne.

BERKEND: Bi rastî wiha ye. Têkiliyên we bi dijminên me re jî, gelek baş in. Em di vê yekê



de gelek spasdarê we ne. Herçiqas hin Kurdên çewt û mewt li dijî dostaniya we bi dijminên me re derdikevin jî, li wan biborin, ew cahîl in, hîn negihîştine tama hevkarîyê bi dijminên me yê dost re.

ALABAN: Dijminên herî dost jî, eger mirov rastiyê bibêje ew in, lê hin kabirakayên hêja vê yêkê fam nakin. Li ser pîrsa Ewropa û dostên me yê li wê derê ez dikarim bêjim ku ew ne mirov in, melayik in. Hingiv in, şekir in. (Bi dizî ji guhê Serok û Sokrates re) hêvî dikim neçe guhên yê dinan, ew segbavê Ewropa û Amerîka ji hemûyan xirabtir in, ew dixwazin em nigên wan paçî bikin. (Cardin bi dengê bilind) ew camêr in, bi kultur in, humanîst in...

SOKRATES: Ez ji van kesan çî fam bikim? Bi çî aliyê wan bawer bikim? Mumkun e ku ev nûner û berpîrsiyarên gelê Kurd bin? Ez bawer nakim gelê Kurd mîna wan bifikire!

SEROK: Helbet wiha nafikire. Lê hîn jî, hin kes hene muhtacê wan in. Çî bikin, jiyana tenê bi polîtîka nameşe, nan jî, ji bo jiyana pêwîst e. Em jî, ji ber vê yekê şerê xwe hereroj bilind dikin daku rojek berê gelê xwe ji vê esaret û ji lepên van kesan azad bikin. Realîta jiyana rê dide ku hîn ramanên wiha çewt jî, li ser zemîna Kurdistan şîna bibin.

SOKRATES: Pîrsgirêk gelek giran e. Xwezî vêga hin dostên minên sofî û fîlosof li vê derê

bûna yan jî, niştevanek ji Athen, Platon li vê derê bûya çêtir bû, ji ber ku wê giş peyvên

me binivîsanda. Tiştên wiha bên nivîsandin ji bo pêşeroja dîrokê baş e.

SEROK: Tu meraq neke, giş tiştên li vê derê tên gotin, zevt dibin. Birêz Yasko û Isvanes li

pişt perdeyê ne, hertiştî dinivîsin. Min xeber dabû hin waqanivîsên nû, ew jî, li vê derê ne.

Tu axaftina xwe berdewam bike.

SOKRATES: Xwezî Xenophon jî, li ba me bûya!

SEROK: Ew jî, li menzela dinê ye, not digire.

SOKRATES: Ez bi guhên xwe bawer nakim, bi rastî tu her tiştî difikirî...

SEROK: Platon jî, li ba Xenophon e, yek kêmbihêle, yê din tamam dike.

Eger her du jî, pê

negîjînin wê Herodot rê li ber kêmasiyan bigre. Ji ber ku Herodot pir di bin bandora Homer

de ye, carna ji dêvla dîrokê çîrokan dinivîsîne; min Thukiydides jî li ba wî daye

rûniştandin. Min got belkî tu bêriya Xantippe bikî, ew jî, çend mal ji me dûr li taxa jorê, bi

zarokan re li cem malbateke Kurd in.

SOKRATES: Ez nizanim çî bibêjim! Baş e, emê sohbeta xwe berdewam bikin. Birêz Tirzo

hun bi salan e li Ewropa ne, we çî başiya wan ji bo gelê Kurd dîtiye ku hun ewçend pesna

wan didin?

TIRZO: Ma min çî feyde nedîtiye, nizanim qala çî bikim! Ew ez kedî kirime.

SOKRATES: Feydeya we yê şexsî napirsim, feydeya gelê Kurd dipirsim...

TIRZO: Ma gelê Kurd ne ez im, ez gelê Kurd yê herî xas im. Em Kurdên li Ewropa

vegeriyane ser eslê xwe, em medenî ne. Em li bajarên paqij dijîn, mûsîka Beethoven, Miçael

Jackson, Haydn guhdarî dikin. Em pirtûk, kovar û rojnameyên wan dixwînin, li fabrîkên wan

kar dikin. Têkiliya me hertim bi medeniyetê re heye. Fîlosof, nivîskar, dîplomat û jinên zerik;

meyxane û xwaringehên paqij, ma ev hemû ne feyde ne ji medeniyetê?

SOKRATES: Ev tiştên hun dibêjin medeniyet be, ez tutişt ji medeniyetê fam nakim.

Mumkun e ji bo we ev medeniyet be, ez ji medeniyeta we û Ewropa fam nakim. Belkî jî,

jiyana em qal dikin; ez, birêz Serok û gelê Kurd, medeniyetek e ku hun naxwazin haya we jê

hebe. Ez bi xwe hîç tiştek nizanîm. Tiştê ez pê dizanim ew e ku ez dixwazim ji

medeniyeta hun qal dikin, gelek dûr bim, naxwazim di ber re jî, derbas bibim û bê wê

medeniyetê cahîl bimînim. Baş e ku Diogenes ne li vê derê ye, feqiro wê ji kerba bimira!

Birêz Arzan carekî din em vegehin sohbeta xwe: Hun di qatîlê Kurdan de çi dibînin, ji wan

hez dikin? Ma ne ew bûn ku di rojekê de bi hezaran Kurd li Halebçe û ciyên din qetil kirin?

Ma ne ew dostê we yê Saddam bû ku heşt hezar Kurd winda kirin, heta niha mirov nizane

çi hatiye serê wan?

ARZAN: Birêz... hun kî ne, navê we çi ye? Hun çima timî hêrîşê dostên me dikin? Ma ez

nizanim ew dijminê me ne! Lê mîna birêz Alaban hîn çêtir tîne ziman, em dîplomasî û

polîtîka dikin. Eger em bixwazin gotina me li cem hin kesan piçek jî, derbas bibe, pêwîst e

em hertiştî bikin, ne wiha ye birêz Alaban?

ALABAN: Çawa? Tu di vê yekê de çi bibêjî, em mîna hev difikirin. Lê tenê di vê yekê de.

Xem nake bila hin kes me şaş fam bikin, ma em nikarin tiştina bikin ku biçin xweşa

herkesî! Em carna tiştina dikin; em dizanin xelet û xetere ne lê divê em bikin ji ber ku qedera

gelekî di destê me de ye.

ARZAN: Ma ew kes çima qedera xwe dane destê me? Ji ber ku dixwazin em qerarê li ser

qedera wan bidin. Eger ew bi xwe vê yekê dixwazin çima em nekin?

SOKRATES: Eger gelê Kurd rûmetek dide we, çima hun bersiva vê rûmetê nadin, hertişt

naxin xizmeta gelê xwe?

ALABAN: Hertişt di xizmeta gelê me de ye. Em têkilî bi dijmin re datînin daku ew gelê me

nekujin, mafek bidine me.

ASIMQEND: Em xwe feda dikin daku gelê me di pêşerojê de rehet bijî.

BERKEND: Em nebin, gelê me pir asî ye, wê şer bike û di demeke kin de bi serê xwe

bimîne; bi tena serê xwe man tiştê nebaş e. Gelê me hînê xwe îdarekirinê nebûye, wê

anarşî derkeve. Em nahêlin, rê li ber digrin daku gelê me bê anarşî di nav gelên din de bijî.

Gelekî bi tena serê xwe, bê girêdanê der û dor êdî zevt nabe, mirov nikare wî îdare bike.

TIRZO: Birêzan hun ji dilê min dipeyivin. Ez ji anarşî nefret dikim, divê hertişt rêkûpêk

be, mîna li Ewropa. Azadî hebe, azadiya rasteqîn; ger kesek bixwaze li dijî rêkûpêkiyê

derkeve, bi çengilê wî bê girtin, ceza wî bê dayîn. Mirov çiqas xwe li gora rêkûpêkiya

civak û dewletê bilivîne ewqas azad dibe, yanî îradeya xwe di nav îradeyeke mezin de

dihelîne. Mîna fîlozofê mezin Bismarck gotiye, divê civak bi dîsîplîn be!

Mirovê bê dîsîplîn ji

azadiyê çî fam dike!

SOKRATES: Nizanim, ma tu pêwendiya Bismarck bi fîlosofan re heye!

Gelo fîlosof hene ku

bi dîsîplîna hun qal dikin re pêwendiya wan hebe? Ew tiştên hun dibêjin piranî polîtîka

dewletên dîktator in. Baş e, em vê yekê berdin. Birêz Asimqend, bi fedakariya we baweriya

min heye, lê gelo ev fîdakariya dema şovalyetiyê nîne? Mirov dîplomasî, polîtîka û

fîdakariya vekirî bi gelê xwe re bike ne çêtir e? Fedakariya we ya ku hun bi jiyana xwe

didin, ji bo gelê we berdelek ne giran e?

ASIMQEND: Belê giran e, lê divê demê de ji destê me tiştêkî din nayê...

SOKRATES: Lê hun dikarin xwe bi gelê xwe yê bakûr ve girê bidin, têkoşîna xwe bikin

yek. Ew di têkoşînê de gelek li pêş in. Hun çima nikarin bi hev re bixebitin?

ASIMQEND: Em dikarin, tu asteng li pêşiya me nîn in ji bilî tevliheviya me ya ku em vê

dawiyê tê de ne. Dijmin gelek zor da me û gelê me. Em bê taqet mane.

SEROK: Lê hêviya rabûna ser xwe hîn venemiriye, ne?

ASIMQEND: Na, lê westan û tirs hene. Dijminê me çavê gel zor tirsandiye, derman pê divê.

SEROK: Derman şer û têkoşîn e.

ASIMQEND: Ev yek taqet dixwaze, rêxistinên xurt dixwaze, kesên fîdayî dixwaze.

SEROK: Ger mesele tenê ew tişt bin ku hun qal dikin, hemû hene. Pêwîst e em rewşa li ba

me bixin nav gelê xwe li parçeya we, ma em nikarin bi hev re bixebitin?

ASIMQEND: Em dikarin, lê çawa?

SEROK: Baş e, emê li ser vê yekê bi hev re rûnên û bipeyivin...

SOKRATES: Birêz Alaban heta ku hun enerjiya xwe li dijî hev xerc dikin, şerê birakujî

dikin, hun giş bi hev re bibin yek, xwe li dijî dijmin xurt bikin ne çêtir e?

ALABAN: Ez bi salan e di nav hêz û rêxistinên Kurdan de mîna polêzê trafîkê diçim û tîm,

dixwazim hemûyan li hev bînim. Pir caran gelek kesan li hev tînim. Ew li hev tên, îcar

navbera min bi wan re xirab dibe. Ne tenê hêzên Kurd, tîkiliya Kurd û dijmin jî, bi min didin

kirin, paşê yê di nav de xirab e, dîsa ez im. Ez nizanim çî bikim! Ez jî hemûyan bêtir tîkilî

datînim lê ew jê feyde digirin û hîn bi min jî, qayîl nabin. Ew ne ji dîplomasî ne ji polîtîka

dinyê û ne ji axretê fam dikin û nahêlin ez li gora dilê xwe kar bikim.

Derdên min pir in.

Rojek dema we hebe, em danîşîn, ez qala tiştên hatine serê xwe bikim, hun qerar bidin û

bêjin ka ez çî bikim!

SOKRATES: Na, spas birêz Alaban, ez naxwazim tiliya xwe bixim nav polîtîka rojhilat ku

tutişt jê fam nakim û bi we re kap avêtin, haşa! Ne karê min e. Ez piçekî din guh bidim

we, pêwîst e bibim şîrîkê kar û kirinên we. We min li ser birakujî yan jî, kurdkujî zelal nekir.

Pircar Kurd bi dijmin re dibin yek li dijî Kurdan, ev nabe birakujî, dibe kurdkujî; hun çî

difikirin?

ALABAN: Ya rastî muhatabê vê pirsê ne ez im. Di vê pirsê de bi kirinên xwe birêz Arzan

pişpor e, ew dikare bersivê çêtir bide.

ARZAN: Nizanim ji xelkê re çî, em birayê xwe dikujin. Ma ew ne birayê me ne. Divê mirov

hinek azad be, bi kêmayî di kuştina birayê xwe de. Paşê em ne bi kêfxweşiya dilê xwe

birayê xwe dikujin, em nekujin, xelk dikuje. Ma birayê me bi destê xelkê bê kuştin çêtir e?

Paşê feydeya gelê me di birakujî de zêdetir e; divê hin ji me feda bin daku yê din azad û

serbest bijîn. Emê ji bo mafê gelê xwe çi ji destê me bê bikin, ne birayê xwe, eger pêwîst be emê dê û bav, zar û zêçên xwe jî, bikujin. Em çi dikin ji bo mafê xwe dikin, ma ji bo mafê xelkê nakin.

ALABAN: Di peyvên birêz Arzan de rastiya Kurdistan pir xweş dibe. Çare nîne xeyo.

Çare hebe mirov çima bi dijmin re bixebite?

SEROK: Çawa çare nîne? Eger hun hîç çare nabînin, xwe bikin bombe û di zikê dijmin

de biteqînin. Ma haya we ji lehengên me jî, nînin?

ALABAN: Lê em bombe di xwe de biteqînin êdî nikarin dîplomasî bikin, ji bo gelê xwe şer

bikin. Paşê hun çima hema wiha zû xwe dilivînin, piçek sebir pêwîst e.

SEROK: Bi hezar salan e eynî stran: sebir. Kevirê sebrê teqiyaye haya we jê tune. Em çil

mîlyon mirov in, heta çil mîlyon bê şeref dimînin, bila çend mîlyon xwe fîda bikin daku

yên din bi şeref bijîn.

ALABAN: Ez bi xwe naxwazim ji wan çend mîlyonan bim, ez dixwazim ji çil mîlyonan

bim. Mafê herkesî heye ku qedera xwe bi xwe tayîn bike.

SEROK: Mafê te ye. Lê wê demê dev ji wan Kurdên ku dixwazin bi şerefa xwe bijîn, berde,

rê li ber wan negire. Çi ye, tu derketiyî bi navê dîplomasî û polîtîka giş Kurdan şerpeze

dikî! Nikarî, dev jê berde; na eger îdîa te hebe, dev ji çewtî û lîstîkan berde.



ALABAN: Yanî ez dîplomasî nekim..?

SEROK: Ew tiştê tu dikî, ne dîplomasî ye. Tu rabûyî, dixwazî bi Mitterrand, Helmut Kohl,

Bill Clinton ûwd. re dîplomasî bikî. Ew bi sedsalan e dîplomasî dikin, tu nikarî li ser zemînê

wan, di salonên wan de bi wan re dîplomasî bikî. Walsa dîplomasî bê qiwet nabe, ma qiweta

te, yan jî qiweta me Kurdan di vî warî de çi ye? Ew mîna guran e, mirov di bin de dibin û

tînin lê tutişt naxin lepên mirov.

ALABAN: Bi rastî min jî, vê yekê fam kiriye, ma em çi bikin, dev ji dîplomasiyê berdin!

SEROK: Na, em dîplomasiya dizî nekin. Divê em bizanin ku dîplomasî walseke zirav e, di

salonan de tê kirin. Dansa di salonan de piranî car di navbera çend kesan de çêdibe; mirov

hînê vê yekê nebûbe, dikare mîna jinên navber, sozê bide pir kesî û nikaribe bîne cî, mîna

dîlbereke di holê de bimîne. Salonên me yê dansê nînin, em govendê li meydana digirin. Di

govenda meydana de hertişt vekirî ye, kî bi kî re, çawa, çi soz, zelal in. Divê em vê demê

di meydana govendê de dîplomasî bikin heta em bigîjin hêza ziraviya salonan. Berî hertiştî

pêwîst e em hêzên xwe bikin yek, bi kêmayî yek dev bin. Gava dost û dijmin yekîtiya hêzên

me bibînin, nikarin mîna dilê xwe bi me bilîzin. Me cidîtir digrin. Gotina me pere dike,

dîplomasî û polîtîka wê demê baş dimeşe. Lê em parçikparî xwe dixin destê dijmin, ew jî,

li gor kêfa xwe bi me dilîze. Ne wisa ye?

ALABAN: Ma mirov ji gotina rast re çi bêje! Lê tu hewl bide ku Kurdên din bînî ba hev,

mesele ez bim, ez ji do ve amade me.

SOKRATES: Birêz Arzan çi mafê birayên we hene ku ew bi destên we bên kuştin? Ma

ferq di nav mirina ji destê bira yan dijmin de heye?

ARZAN: Çawa tune! Lê ya rastî em jî, vê yekê ne ji kêfxweşiya dilê xwe dikin; dijmin xurt

e. Em nekin ew hîn barbartir dikin. Em bi wan re li hev tî daku çend Kurd ji me bikarin li

jiyanê bimînin.

SOKRATES: Yanî hun ji bo jiyana çend kesan gelê xwe fîda dikin?

ARZAN: Ma ew çend kes jî, gelê me ne; em mafê gelê bi xwe re dikarin biparêzin, qiweta

me nîne ku em giş gel biparêzin. Ne ku em naxwazin, bi rastî em êvîndarê gelê xwe ne, çi

parçeyê Kurdistan dibe bila bibe. Lê zora me naçe dijmin. Em realîteya xwe dizanin, em

dizanin zora me diçe kî. Ji bo me li dijî Kurdên parçeyên din şerkirin hêsantir e; dijminên

me zor zêde ne, em nikarin bi wan. Qiweta me neçe wan, pêwîst e em hustîxwariya xwe li

pêş wan bipejirînin û diyar bikin.

SOKRATES: Gelo hun nikarin tîkiliyên xwe bi dijminên xwe re wisa deynin ku ew tîkilî

zerar nedin Kurdên parçeyên din?

ARZAN: Em dikarin lê dijmin qebûl nake. Mafê wan jî heye ku şertan deynin pêş me.

BERKEND: Ez dikarim şahîdî bikim ku di têkiliyan de birêz Arzan gelek li ser disekine ku

her du alî jî, zerarê nebînin.

SOKRATES: Yanî aliyê dijmin û birêz Arzan. Baş e, li ser aliyê Kurdên din çi ked û xebat

hene? Ji bo parastina wan çi tê kirin?

SEROK: Tiştek nayê kirin birêz Sokrates. Ew dev ji Kurdên din berdî bes e. Lê bi têkiliyên

xwe, ji êvîndariya xwe bi dijmin re, ew parçeyên din nafikirin. Em dizanin ew mecbûr in bi

dijmin re hin têkiliyan deynin. Lê ew bi têkiliyan nasekinin, dibin pepûk û êvîndar; ev yek li

giş Kurdên din gelek zor tê.

SOKRATES: Ev êvîndarî ji tirs tê, ji çi ye?

SEROK: Hun dizanin ku giyana mirov dikeve gelek rewşan. Carna êvîndarî, xwe diguhizîne

nefreteke mezin, carna jî, tirs û nefret xwe diguhizînin êvîndariyê. Di rewşa li pêş me de

her du jî, rast lê nayên.

ARZAN: Pêwîst e em ji wan mirovan hez bikin, mirov ji hinekan hez neke, nikare pê re

bixebite. Em jî, dostaniya xwe li ser rastiya datînin. Em nikarin kesî bixapînin; ev di mêraniya

me de nabe. Divê em durust bin.

SEROK: Birêz Arzan, eger hun li durustiya dema şovalyetî digerin, ew yek ji zû ve miriye.

Di polîtîka û dîplomasî de bi dijmin re durustî desrbas nabe. Hun çiqas durust bin, dijmin

ewqas ji we feyde digire. Durustiya mezin divê hun bi gelê xwe re bikin. Pêwendiyên we bi

gelê we yê parçeyên din re pêwîst e durust bin. Lê hun bi sedema durustî û peymanana bi

dijmin re li dijî gelê xwe dikevin nav şer, gelê xwe dikujin; durustî li kuderê ma? Herkes

mafê gelê xwe diparêze, hun rabûne qala soz û peymanên durust bi dijmin re dikin.

ASIMQEND: Bi rastî jî, ez tu durustî di vê yekê de nabînim. Ji min re gelek tişt ronî dibin.

Kes nabêje pêwendî daneyne. Divê pêwendiya mirov datîne, zarar nede Kurdên parçeyên din li Kurdistan.

SEROK: Dijmin me parçe kiriye, ev rastiya me ye; lê em çî dikin li dijî vê rastiya neheq?

Pirs di vê derê de ye, gerek em ne li dijî hev dijî rastiya xwe şer bikin, ew rastiya ji hêla

hêzên biyanî li serê me teşîrêsbûye.

ARZAN: Dibe ku gotina we rast be, lê rastiya me û ya we ne yek in. Em ketine rêyeke din û ji

bo me jê veeger nîne. Me ne tenê soz û peyman dane, em bi wan kesên ji bo we dijmin in hev

baş fam dikin. Herkes ji xwe re, mafê we tune, hun li ser qedera me biryarê bidin. Em bi kî

re, çawa dixebitin azad in.

SOKRATES: Eger azadiya hun dixwazin zerar bide Kurdên parçeyên din?

BERKEND: Em bi xwe ji parçeya mezin in û tu zerarê tê de nabînin.

TIRZO: Ma di pêwendiyên dîplomasî de çi zerar hene? Ez bi xwe li gel vî tiştî me ku

têkiliyên me tenê bi mirovên medenî re hebin. Kurd piranî ji medeniyetê fam nakin, em bi

Ewropiyan re bixebitin çêtir e. Ji xwe min têkiliya xwe ji zû ve ji Kurdan biriye. Ez bi wan

re şerm dikim. Wê rojê min telefonê malê kir, giş xortên eşîra me çûne serê çiya. Ez pir

qehirîm, min ji diya xwe re got ez carekî din li wan nagerim, ma ev çi barbarî ye. Diya min

telefonê li ser rûyê min girt û got lawo şîrê min li te helal nebe! Ew jî, çend lîtir şîr daye

min hertim qala şîrê xwe dike, çi îptîdayî. Eger ew li Ewropa bûya, minê bi sedan lîtir şîr

bikiriya, bidanê. Ma şîr çi ye?

SEROK: Birêz Sokrates tu guh didî, mejî û giyanên pir Kurdan tevlîhev bûne, nexweş in,

derman pêwîst e; laşê wan dermanê gelê me êdî nagire. Divê em dermanek bibînin ku li dijî

vê nexweşiyê bi kêr bê.

SOKRATES: Thales li Mezopotamya pir geriyabû, li wê derê fêrî magî yanî sihêr bûbû,

paşê çûbû Misirê hekîmî fêr bûbû; li gor wî kesên wan welatan dermanê her nexweşiyê

dîtibûn.

SEROK: Dermanê nexweşiya giyan û lares (kangren) çi ye li gor Thales?

SOKRATES: Ew digot, ger nexweşî kangren bûya jêdikirin daku navêje giş laşê. Lê

Hippokrates hîn li ser nexweşiya kangren dixebite, nizanim çareserî dibîne yan na! Gava

diya min li cem jinên ducan bû, carna zarok dervediket. Eger zarok dernekeve digot diya min,

ji dê re jî, xetera mirinê heye; ji ber vê yekê wê li gor rewşê xilaskirina dê yan zarok digirt

pêş xwe daku her du bi hev re nemirin. Zayîn hertim bi êş e lê carna bi mirin dawî lê tê. Ji

bo zayîn bê mirin be, pêwîst e mirov hertiştî bike. Lê carna mirov bê çare ye, ne wisa?

SEROK: Carna, pircar. Eger ew zarok Kurdistan be hîn bêtir. Emê bê westan li dermanan, li

çareseriyê bigerin.

ARZAN: Li gundê me pir zarok seqet dizên, pir caran dayik dimirin, mixabin.

SEROK: Mirov dibîne.

ARZAN: Çi dibîne?

SEROK: Pir caran zarok seqet dizên.

ARZAN: Çawa?

SEROK: Ma hun hîç li ser kar û kirinên xwe nafikirin? Karên we karên mejuyê tendurust in?

We giş taqeta xwe daye ser dostaniya bi dijmin re û hun jî, baş dizanin ku tu rûmeta we li

ba dijmin tune. Tirzo nizane çi dipeyive, heyrana Ewropa ye. Li ser nafikire, Ewropa ew

rehetiya xwe, dewlemendiya xwe ji kuderê digre. Ewropa li dervayê sînorên xwe çiqas

barbar e hun naxwazin bibînin.

BERKEND: Em naxwazin kes dev bavêje dostên me. Medeniyeta me ji wan tê, em heyranê

wan in; ma emê heyranê kevirên serê çiyayê bin?

TIRZO: Em ji çiya û heriyê hez nakin. Em naxwazin vegehin ji yana sefîl. Kengê we

Kurdistan xilas kir û gihand medeniyeta Ewropa, emê wê demê bînin û alîkariya we bikin. Em

vêga qala welatê dikin li Ewropa lê em dijûnan bi şerê çiyayê dikin. Em wiha nekin, dostên

me û mirovên Ewropê bi çavekê barbarî li me dinêrin, em naxwazin kes li me bi çavê ne

sivîl binêre. Ewropê gelek çek û sîleh hildiberînin lê ew dest nadinê, bi xwe kesê nakujin.

Kesên welatên paşvemaçî çî dikin, wan çekan digrin destên xwe hêrîşê derê dorên xwe

dikin. Na, ez vê yekê tucar napejirînim.

BERKEND: Rast e birêz Tirzo, lê divê mirov xwe li gor rewşê bilivîne. Em jî, ji çekan

nefret dikin. Ji çekan jî dijmin, emê destê xwe dirêjî dijmin bikin, jê dostanî bixwazin. Dibe

ku ew bi çekan bînin ser me lê em mirovhez in, em şer naxwazin. Xema nake bila ew li me

bixin, rojek ewê ji kirinên xwe bi xwe poşman bibin.

TIRZO: Pirs ev e birêz Berkend, bihêle bila dijminê te ji kirinên xwe poşman bibe. Ew li te

bixe, tu jî, rabî lêxî nabe. Divê aliyek xwe bi aqil bilivîne. Dijmin ne kevir e, ew jî, mirov e;

wê carek te bikuje, ma nikare deh caran te bikuje. Tişt nabe bila carek em bimrin, ma çi

dibe, mirovahî nemaye. Pêwîst e em humanîst bin yanî mirovhez; herî zêde jî, divê em ji

dijmin û qatîlên xwe hez bikin, wê rojek bê ewê poşman bin...

SEROK: Kurdo feqîro, Kurdo şerpezeyo!

SOKRATES: Nizanim, eger Thalesê Milletî li vê derê bûya wê çi bigota! Baş e ku

Diogenes ne li vê derê ye! Hêviya min Hippokrates di demeke kin de dermanek li dijî

bêaqiliyê bibîne. Piştî ez guhdariya birêz Tirzo dikim, hîn bêtir bi êşa Kurdan dihesim û hîn

bêtir barbariya Ewropa fam dikim. Gelo em xwe nekşînin nav sohbeta xwe bi Kurdên xwe

yên din re?

SEROK: Ev jî, Kurdên me ne lê Kurdên me yên din in.

SOKRATES: Yanî bi du awayî Kurdên me hene, her du jî, bi awayek Kurdên me ne û her dû

jî bi awayek Kurdên me yên din in?

SEROK: Kurdên me yên din Kurdên me ne. Ev Kurd jî, Kurdên me ne lê ne bi awayê Kurdên

me yên din. Ji aliyê din jî, ev Kurd Kurdên me yên din in lê ne mîna Kurdên me yên din

Kurdên me ne.

SOKRATES: Mesela sêveke me heye lê ew sêv hem ya me ye hem ne ya me ye. Ew sêv bi



awayek ya me ye ji ber ku ji dara erdê me ye, lê ew bi awayekî din ne ya  
me ye ji ber ku ji  
dara erdê me qetiyaye, ketiye destê kesên din. Lê sêva di destê kesên din  
de sêva me ye. Ji ber  
ku ew di destê kesên din de ye, ne ya me ye.  
SEROK: Ev Kurd jî wisa, lê bi awayekî din. Ferqa van Kurd û sêvê ew e ku  
ev dikarin  
daxwaz diyar bikin lê sêv nikare. Eger sêv nikare daxwaz diyar bike, em  
nikarin bêjin ew ya  
me ye yan ne ya me ye. Ew dimîne li ser hêza me ya têkoşînê li ser sêvê.  
Ev Kurd yên me ne  
lê daxwaz diyar dikin ku ne yên me ne lê dîsa jî, ew yên me ne bi awayekî  
din. Kurdên me  
yên ku daxwaz diyar kirine ew ji xwe yên me ne. Ji ber ku em li ba Kurdên  
daxwaz ne  
diyarkirî ne û Kurdên me yên daxwaz diyarkirî, ne li vê derê ne; ew  
Kurdên me yên din in. Lê  
em li ba van Kurdan e ku bi daxwaza xwe, ne Kurdên me ne, ji ber vê yekê  
ji me dûr in û em  
li ba wan bin jî, ew Kurdên me yên din, bi awayekî din in.,  
SOKRATES: Mirov dikare li ser daxwaz tesîr bike lê nikare biguhire. Ma  
em nikarin bikevin  
sohbeteke kûr daku em li ser wan tesîr bikin?  
SEROK: Em dikarin. Emê hertim jî, biceribînin. Ji bo sohbetê kûr divê  
kûrahî hebe. Ez di  
piraniya van Kurdan de ku hem yên me ne û hem ne yên me ne, kûrahî  
nabînim.

SOKRATES: Em nikarin bi wan re zelal û bi gotinên vekirî hêdî hêdî bipeyivin?

SEROK: Em dikarin lê ew guh nadin peyvan. Dijmin bi wan re napeyive, wan cidî nagire û dijmin e lê ew dîsa pê re ne, çima? Ji ber ku dijmin bi hêz e, dihêle ew û çend kesên wan bijîn, alîkariya diravî dike. Mirovê birçî û tazî bi peyvên xweş qanî nabe. Bi gotinan mîna me bifikirin jî, heta ku em ji dijmin bi hêztir nebin û hinek jî, alîkariya wan nekin, ew venagerin nav me. Em realîst in, rastiya welatê xwe dizanin. Du rê li pêş me hene.

SOKRATES: Ê ew du rê çî ne?

SEROK: Yek: pêwîst e em hêza xwe bidin ser gelê xwe yê ku dixwaze li pey îdeal û meziyetên bilind bimeşe û hewl bidin ku tesîra netewhezî û welatparêzî bilind bibe. Bi vî awayî emê bikarin rê li ber xurtbûn û tehrîbata kesên wiha bigrin. Ev rê herî rast e. Du: divê em xwe gelek xurt bikin ku karibin ji aliyê diravî alîkariya wan Kurdên xwe yê durust bikin ku ji ber qelsiya xwe di nav lepên dijmin de mane. Giş qiweta me divê li ser milê gelê me be û ew hêza me ya bingeh be; polîtîka û dîplomasî bê pêwendiya gel nameşe. Divê di hertiştên tînin kirin de gel xwediyê rola eslî be, ne fîguran be.

SOKRATES: Li ser Kurdên di bîr û baweriya çewt û xeyalan de ne, dikare çî bê kirin? Tê

dîtin kesên li Ewropa di çî cahîliyê de dijîn...

SEROK: Ne giş. Tirzo mînakek negatîv e. Kurdên wisa mirov dikare bi tiliya bijmêre, ne

zêde ne. Ew sah kiriye li Ewropa medeniyet heye û bi xwe nizane medeniyet çî ye, ketiye

pey bîna û jiyana li gor xwe xweşik dibîne. Ew nîvxwende ye. Dereng dest bi tiştan kiriye,

piranî şaş fam dike, tiştên dixwîne, çewt şirove dike. Navê hin nivîskar û zanayên

Ewropa hatine guhên wî, hemûyan tevlîhev dike. Haya kesên wisa ji dewlemendiya çand û

dîroka wan, ji serfiraziya gelê wan nîne, ketine pey hin tiştan, li gor xwe rast dibînin.

SOKRATES: Lê Tirzo hîn nizane ka kî fîlozof e, kî çî difikire, qala wan dike. Ma mirov

tişteki nizanibe dibe heyran? Gelo mumkun e ku mirov rojek bêje ez vî tiştî zanim?

SEROK: Mirov bizane, xwe navêje ser tiştên wisa. Ew heyrana Ewropa ye, hîn nizane

Ewropa bi çanda we, fîlosofiya we serbilind e, pesna xwe bi we dide. Ew zanibe çima

venegere ser çanda xwe, têkoşîna parastina çand û welatê xwe? Ew bajarên beton ji dêvla

çiya û xwezayê Kurdistan tercîh kirine. Lê emê hewl bidin ku hemû Kurdên xwe, bi her

awayî ji êş û derdên wan azad bikin!

SOKRATES: Baweriya min ji vegera kesên wisa tune. Lê hêvî hertim li pêş e. Xebata

Kurdan gelek hêvî dide min.

Diyalog - IX-

Pirsgirêka Kalemêran

SOKRATES

û

SEROK

SOKRATES: Te got piranî Kurd problem in lê problemên herî mezin jî, piranî rûspî û

pîremêrên Kurdan e?

SEROK: Belê.

SOKRATES: Lê eger ew pîremêr û rûspî ne, çima problem in? Na, eger ew problem in,

çima rûspî û pîremêr tên hesabandin?

SEROK: Ez jî, hertim vê pirsê ji xwe dikim!

SOKRATES: Bersiva te çi ye?

SEROK: Mîna tu dizanî, derdê Kurdan ne yek û dido û sisê ûwd. ne. Di civaka me de gelek

tişt li hev nayên, li hev diqelibin; bi salan bîndestî nehîştîye karaktereke serbixwe biafire,

kesayetiyeke azad derkeve. Hertim eynî pirsgirêk: Kêmasî û nebûna kesayetiya li ser xwe ji

bo civak, ji bo civak li ser nigên xwe, ji bo xwe bi civak û bi civak ji bo parastina nîrxên

kesayetiya dilberz.

SOKRATES: Pirsgirêkên Kurdan fam dikim. Civaka Kurd di nav xwe de gelek bi mixrik e,

ev tiştê siruşt e. Hemû civak di nav xwe de bi mixrik in, bê mixrik pêşketina civak û

kesayetî jî, li anegora pêşveçûna taybetiya xwezayê ne mumkun e. Tiştê ku ez fam nakim;

li beramber evçend mixrik û pêşveçûna civakê çima kesayetiyên mezin, kesayetiyên

dilberz, bi bîneriya dûr û dirêj zêde dernakevin? Gelo derdikevin ez nabînim yan ez dibînim

ew dernakevin yan ew dernakevin ez nabînim yan jî, ez nabînim ew dernakevin?

SEROK: Di van salên dawî de civaka me bi lez pêş ve ket. Lezîna pêşketinê bi xwe re

astengên pêşveçûna nerast jî anî. Gava civak ji paşvemanêke tund bi lez derbasî

pêşketinêke tund bibe, ev rewş bi xwe re hin astengiyan tîne ku ev tiştêkî ne ecêb e. Tiştê

herî ecêb ev e ku ew kesên di lezîna pêşketinê de xwedî kar û qudret in, zêde astengî

derbasî, yên ku zêde asteng in ew kes in ku bi salan temenê xwe derbas kirine lê bi carekî ve

bi xwe hesiyane û rabûne ketine nav meşa azadî. Meşa azadî diherike, mirov dikare hertim

pê re bimeşe, ne şert e ku ji destpêkê pê re bûbe. Ji xwe destpêkê û dawiya meşa azadî nabe,

mirov ji ciyekî tevî wê dibe û diherike.

SOKRATES: Baş e, ew pîremêr yanî rûspî tevî meşa azadî nebûne? Eger bûne çawa û

çima bûne, eger nebûne çima nebûne?

SEROK: Gelek ji wan tevî têkoşinê bûne; piranî ji wan berê jî, têkoşer bûne, ber xwe dane

lê ne bi awayê me. Ew hatine nav me, ma ji xwe ev têkoşîn ya wan e, ya hemû Kurdan e. Ne tenê ya Kurdan ya giş kesên mirovhez, bindest û azadîxwazan e. Hinek ji wan tên nav

têkoşînê, li me minetan dikin, tu dibêjî qey ew ji bo min vî karî dikin!

SOKRATES: Ez hîç ji kal û pîrên qarqarok hez nakim. Pîremêr pircaran bi kêr nayên. Emrê xwe vala derbas dikin. Mirovê emrê xwe vala derbas bike ji bo min mîna darekî ziwa ye. Çi pêwîstiya we bi wan heye, nexin nav xwe!

SEROK: Nabe birêz Sokrates. Pîremêr giş ne wisa ne. Em qala qelsiya xwe dikin daku çareyek jê re bibînin. Rast e mirovên emrê xwe vala derbas dikin mîna darê ziwa ne lê darê ziwa jî, mirov dikare zivistanê bişewitîne, xwe li ber germ bike. Yê me piranî bi kêrî şewitandinê jî nayên lê em çî bikin, mezinên me ne, emê rûmeta mirinê bidine wan.

SOKRATES: Tu dikarî ji min re piçek qala wan pîremêran bikî?

SEROK: Pîremêrên me du gotin ji bo têkoşînê dibêjin, mîna ku welat ji destê dijmin rizgar kiribin ji me rûmetê dixwazin. Pircaran gava bi navê me dipeyivin dikevin nav ajîtasyonan, teng dibin û bi navê me hin dostên me jî, ji me dixeyidînin. Ez karê her kesekî bi rûmet dibînim lê kesên me pircaran rêzdana me çewt şirove dikin.

SOKRATES: Ev kal û keftar çî dikin, pîşeya wan çî ye, ji kîjan beşên civakê ne, qudreta

wan çî ye? Bi çiyên xwe bawer in ku karên we hîn giran dikin?

SEROK: Ji her beşên civakê ne: tixtor in, abokat in, mamoste ne, feqî û mele ne, nivîskar û

rojnamevan in, muhendis û zimanzan in, karmendên dewletê ne, helbestvan in ûwd. Tiştê

herî neqenc jî, ev qencên me ne. Em qala qenc û neqencên dervayê xwe nakin. Piranî nivîskar

in, nizanin binivîsîn. Zimanzan in tenê dikarin Kurdî bixwînin û binivîsîn, tu bibêjî ziman

çî ye, ew zimanê xwe ji te re derdixin. Tixtor, tenê aspirînê nas dikin, bi xwe bi salan e

nexweş in, nizanin nexweşiya wan çî ye. Abokat in deriyê dadgehê nas nakin. Feqî û mele

fêrî fêlbaziyê bûne. Hinek ji wan dikarin ji te re quranê ji ber bixwînin lê ne xweda ne

pêxember dikarin li hember wan gotinek bibêjin. Helbestvan; heta vêga min Kurdek nedîtiye

ku ne helbestvan be. Hemû Kurd helbestan dinivîsîn lê nizanim kî van helbestan dibîne,

dixwîne yan fam dike?

SOKRATES: Bi rastî rewş ne ewçend hêsan e. Ez ji pîremêrên Kurd tirsyam. Baş e, ew

nikarin bi karên xwe, bi baş û xirabiya xwe li hember dijminê xwe tiştina bikin? Çima bela

xwe li we didin?

SEROK: Tu ji wan bipirsî giş kar û pêşketin bi xebata wan e, lê di rastiyê de ew pircaran li

ber xortan asteng in. Keç û xort, ciwanên Kurd li gor qudreta xwe ji bo welatê xwe çî ji destên wan bê dîkin. Ez nabêjim şaşî û kêmasî nakin; hin ciwan jî gelek bedbextî dîkin lê niha mijara me pîremêr in, emê li ser wan rawestin. Kal û pîr carna mîna zarokên pêncsalî ne.

Ew dixwazin hertim mirov gotina wan bike û piştî wan miz bide, pişo pişo bêje. Aliyê baş yê kar û xebat hertim ji xwe re dixwazin. Bi ya wan be pêwîst e li dora wan gelek ciwan mîna perwane bigerin. Xasma ciwan ji wan gelek zêde kar dîkin û di karên xwe de rast û zana ne.

SOKRATES: Heyfa ciwanên Kurd ji destên van pîr û kalan. Hun çîma wan naşînin nav dijmin, li wê derê feyda wan ji we re ne zêdetir e? Pîremêr hertim, di her civakê de mîna zarokan e lê pîremêrên civakên hin welatan gelek jîr û bi feyde ne.

SEROK: Mixabin di civaka me de pîremêrên jîr kêr in. Hin pîremêrên me yê jîr hene lê bi gelemperî pîremêrên me mîna zarokan e. Tu çî karî bidî wan nabêjin na! Di civînan de kar digrin ser xwe, ji civînê şûn ve deng ji wan dernayê; karê girtine ser xwe davêjin ser kesên din. Lê ev rewşa hemû Kurdan e. Karaktereke netewî ye: Kurd tucar nabêjin ew nizanin yan nikarin. Herkes hertiştî dizane û tukes tutiştî nake. Gava tu karekî bidî ser Kurdekî divê tu



kesekî jî bidî ba wî ku ew wî karî bimeşîne. Carna divê tu kar bidî yekî û yekî din û yekî din

û yekî din, dawiyê dîsa hesaba xwe bikî ew kar li ser te dimîne. Kurd di civîn û civakan de

hertiştî dikarin lê tenê di civîn û civakan de. Kurd ji xwe re kêmasî dibînin ku bibêjin ez

nizanim, ez nikarim, ew hertim dizanin û dikarin lê nakin.

SOKRATES: Gelo çima, sedem çi ne?

SEROK: Çend sedemên girîng ev in: a-Kurd quwet û qudreta xwe kêm dinasin, b-plan û

program çênakin, c- di jiyana rojane ya Kurdan de na, nizanim, nikarim, nebaş im gotinên

biyanî ne, d- gurura feodalî di wan de heye, bi lorikên mêranî mezin bûne, e- dixwazin bikin,

lê bê hesab in, f- ji gotin û rexneyan ditirsin, naxwazin rexne bê ser wan, g- digrin ser xwe

nakin, me jî, xwe jî dixapînin, h- bi ramana nûjen dest navêjin tiştan, i- ew tevgera gelê Kurd

baş nas nakin... û bi sedan sedemên din hene. Lê em ne psîkolog in, em siyasetê dimeşînin,

sebra me jî, bi sînore. Tiştê herî girîng ew hesab nakin ku sebra me jî, heta sînorekî ye. Ma

emê çima rûmet bidin kesên kêrnehatî û bi ser de jî, dibin bar li ser piştê me. Em dixwazin

rêzdana vala, rêzdana bê ked rakin, ji rêzdana feodalî xilas bin, hinek jî, me carekî din

dikşînin nav wê rewşê. Em rêz didin ked û zanebûna mirov, em rêz nadin temenê mirov.

Rêzdariya temenê bi sînor e. Em rûmeta temenê bigrin, emê rûmeta dar û keviran bigrin, ji

ber ku temenê wan gelek e. Hin zinar milyon salî ne, çima em rûmet nadin zinaran?

SOKRATES: Min jî dixwast vê yekê bînim ziman. Me tucar rûmet nedida Thales,

Anaximanders, Heraklit, Zenon ûwd. ji ber ku ew pîremêr bûn. Me rûmet dida raman û

zanyariya wan. Baş tê bîra min ku tu şagirtên min ji bo temenê min rêzdariya min nedigirt.

Heta, piştî min şagirtek bi navê Diogenes hebû ew rêzdariya tu kesî nedigirt. Rûmet dida

jiyana segan, li gor ramana wî seg ji herkesî bêtir heqaretê didîtin û ew jî, mîna seg dijiya. Lê

divê ez vê rastiye bînim ziman ku têgîştina Diogenes zor e. Em fanî pêwîstî bi hin tiştên vê

cîhanê dibînin. Belê li cem me wisa bû ku kes rûmetê nedida temenê mirov. Hertim me

rûmetê bi hêza ramanên xwe digirt. Gava em kom dibûn daku em li ser pirsekê bipeyivin,

ciwan bi pirsên tûj dihatin ser me. Heta jina min Xantippe jî, tucar rêzdariya temengirtinê fêrî

zarokan nedikir.

SEROK: Te pircaran Xantippe birçî dihîşt, lê pîremêrên me ne birçî ne jî.

SOKRATES: Rast e, ez bi xwe hertim birçî bûm lê nan û xwarin hîç nedihat bîra min.

SEROK: Tê bîra te, tu li kuçeyên Atîna havîn û zivistan bê şekal digeriyayî, tenê ebayek li

ser te bû. Ma li te ne sar hebû?

SOKRATES: Sar û germ, hişk û ziwa, tûj û şêrîn, têr û birçî ûwd. ma mirov dikare van

tiştan bigire, bibîne yan ji holê rake? Gelo ew hene yan em wisa hîs dikin? Min biryar dabû

ku tiştên ji dervayê min û îradeya min hene, tiştên ez wan nikarim bibînim û tesbît bikim, ji

xwe re nekim pirsgirêk. Min nedixast hîsên min li ser min hukum bikin, min hîsên xwe dixist

bin îradeya mejiyê xwe; ji ber wê yekê jî, hebûna wan ji min re giran nedihat. Hebûna wan

tunebûna wan îspat dikir, tunebûna wan ji min re dida diyarkirin ku ew hene. Min nedihîşt

tiştên netişt ji dervayê eztişt û eznetişt li ser min tesîr bikin. Bi vî awayî netesîrkirina

wan bi min dida hîskirin ku ew di rastiye de li min tesîr dikin. Li min tesîrkirina wan îspata

netesîrkirina wan bû. Min hebûna wan li dervayê hebûna xwe, nehebûna wan dikir hebûna

xwe. Hebûna min hebûna wan û nehebûna wan îspat dikir. Hun nikarin hebûna pîremêrên

xwe mîna nehebûna wan bihesibînin?

SEROK: Belê, ew hene lê ew heyînê najîn. Mirov dikare nebûna neqencyê mîna hebûna

qencyê bihesibîne lê nebûna neqencyê îspata nebûna qencyê ye jî, çawa ku hebûna

qencyê îspata hebûna neqencyê ye jî. Çiqas qencî û neqencî bê hev nebin, ewqas jî, bi hev

re nabin. Sar, germ, hişk, ziwa, çima û çawa hene, yan hebûna hîsên me hebûna wan bi

xwe re tîne? Baş e, îspata hebûna hîs çi ye? Em dikarin hîs bînin ber çavên xwe bê ku

tesîrek ji derva lê bikeve? Bê tesîra derva hîs diyar nebe, gelo ev ne îspata nebûna wî ye? Di

îspata nebûna tiştê de hebûna wî jî tune? Hebûn bi xwe ne berîqîna nebûnê ye? Eger hebûn

berîqîna nebûnê ye, em nikarin hebûnê bi nebûnê yek bibînin? Eger em hebûnê bi nebûnê re

yek bibînin, gelo nebûn jî nabe hebûn. Hebûn nebûn be çima ew ne yektişt e, eger ew

yektişt e, çima em qala du tiştan dikin? Mezin biçûk be, biçûk jî, mezin e. Lê çima em

carek mezin, carek biçûk bi lêv dikin? Hebûna mezin ne îspata hebûna biçûk e, hebûna

biçûk ne nebûna mezin e? Nebûna biçûk, nebûna mezin e jî, lê nebûna biçûk û mezin

hebûna wan e jî.

SOKRATES: Ji ber vê yekê pêwîst e, mirov carekî din jî, rewşa pîremêran bîne ber çav.

Pîremêr bila mîna dîkê serê sibê neqêrin; ew qerîna xwe ji ciwanan digrin. Ciwanî nebe, kalî

jî nabe. Hebûna kalî bi hebûna ciwanî, tunebûna ciwanî jî, ne tunebûna kalî ye? Bersiva pirsê

kalî yan ciwanî berê ye, mumkun e bê dayîn? Cehalet berê bû yan zanyarî? Mirov dikare bêje

ciwanî û cehalet berê ne? Eger cehalet berê ye zanyarî paşê ye, lê paşê dîsa cehalet nayê?

Beriya berê çawa bû? Paşîya paşê çawa ye? Paşîya berê û beriya paşê dikare bê bersivdan?

SEROK: Giş xebata min li ser wê yekê ye ku ez ji Kurdan re bidim zanîn, ew xwe, hebûn û

nebûna xwe, der û dora xwe nas nakin. Gotinên di devên wan de piranî tenê gotin in. Ma

gotin bê mane dibin? Eger gotin bê mane bin çima tên gotin? Eger tên gotin çima bê mane

ne? Mirov ne mecbûr e hertim xwe bi gotinan bîne ziman. Carna bêdengî ji gotinan zêdetir

mane îfade dike. Gotin xwedî kirin bin mane îfade dikin. Divê her gotin xwediyê kirina xwe

bi xwe be, rastiya xwe bîne ziman, karê xwe bîne cî. Kes ji kesî re nabêje gotinên bê mane

bike yan neke, lê heqê herkesî heye ku rêzdariya gotinên ne di ciyê xwe de ne, negire. Beriya

ku mirov xwe davêje ser gotinek, ser karek divê hesabê xwe baş bike û dawiya bûyerê

bifikire. Pirsgirêkek jî ew e ku gotin û kirin pircaran li pêş hesabê ne.

SOKRATES: Pîrejin çawa ne, ew jî, mîna pîremêran e?

SEROK: Te pirseke baş kir. Rewşa jinan di civaka me de tiştekî din e. Ez naxwazim li ser

rewş û pirsê jinan bisekinim lê hinek rastiya wan bînim ziman. Li Kurdistan hertim li

hember derva, karên derva gotina mêran derbas bûye. Gotina jinan hebe li malê ye. Jin bi derva re pir neketine nav têkiliyan, di sînorê mal û civaka xwe de mane. Ji ber vê yekê jî, jin neqencî negihîştandine civaka xwe. Neqenciyan ji aliyê jinan gihîştine civakê jî, bi riya mêran gihîştine. Tu li dîroka Kurdistan binêrî, tê nikaribî jinek bibînî ku xayîn bûye, caş bûye; bi riya mîr, bav û birayên wan pêwendiya wan bi derva û dijmin re çêbûye. Pîrejinên Kurd tu astengî li ber kar û bar dernaxin. Kêmhejmara jinên rewşenbîr û xwedîpîşe rê li ber xwedîpeyvbûna wan teng hîştîye. Pîrejin ji pîremêran şoreşgertir in, fîdakar û nermtir in. Keçên Kurd di şoreşa me de ferqa navbera xwe û xortan rakirine; ji xortan bihurîne. Ew di nav xebata dereng bixwehesînê hîn bêtir fîdakarî dikin, pêwîstî pê dibînin ku hîn bêtir xwe bidin pejirandin û efsaneyan diafirînin. Ez vê pîrsê li vê derê kin digrim.

SOKRATES: Baş ku jinên we ne mîna jinên me ne. Xantippe baş bû lê zor bû.

SEROK: Jinên me yê ne qenc jî, hene. Jineke min hebû, Xantippe li ba wê melek dima.

Xantippe bi welat û civaka xwe re durust bû.

SOKRATES: Bi rastî Xantippe gelek welatparêz bû. Ew di şerên Potidaia, Amfîpolis û Delion de kêfxweşiya xwe bi tevlîbûna min anî. Xwedîkirina zarokan girt ser xwe ji min re

bû alîkar.

SEROK: Ango di civaka we de jî, şer karê mêran bû?

SOKRATES: Hinek wisa bû. Jin di mîtolojî de rol digirtin ser xwe lê di jiyana rojane de rola

wan mîna jinên civakên din bi mal û zarok ve bî sînor bû. Di demokrasiya Atîna de mafê

hilbijartinê yê jinan tunebû. Lê em vegerin ser xala xwe; ew pîremêrên we çima mutewazî

xizmeta civak û welatê xwe nakin?

SEROK: Tu ji wan re wisa bibêjî, te xayîn, ajan û nizanim çi bi nav dîkin. Etîka mirovahiyê,

etîka raman û rewşenbîriyê di mirovên me de hatiyê kêmkirin. Dijmin mejiyê mirovên me

şêlandiye, parçe parçe kiriye, daxwaza me ew e ku em komî ser hev bikin. Mejiyê Kurd

piranî ji bo biyaniyan xebitiye. Ev tiştê em dîkin emeliyat e, em di mejî de emeliyat dîkin ku

cardin komî ser hev be û bikeve xizmeta Kurdan.

SOKRATES: Di emeliyatan de mirin jî heye, hun natirsin?

SEROK: Tirsê me mirin nîne. Em hewl didin ku piştî emeliyatê ucubeyekî din dernekeve.

Em li dijî jara dijmin şerbeta vegeza Kurdayetî û mirovhezîyê didin wan; em dizanin ku pir

pozîtîv dikare negatîv bi xwe re bîne. Em bi sebir li ser tedawiya pozîtîv disekin û emê bi vê

yekê bidomînin jî. Ji ber ku hin mînakên negatîv jî, tedawiya nexweşiyê li pêş me hene, em

baş nabînin. Ev yek carna serketî be jî, şopên gelek neqenc paş ve dihêle.  
Zor û

zehmetiyên me hene. Civaka me bi êş e, em nakevin xeyala hêsaniyê, lê  
daxwaza me heta ji  
me bê xewnereşk kê m bin!

SOKRATES: Hun ji niha ve tedbîran nagirin?

SEROK: Çawa! Mirov çiqas tedbîran bigire jî, têr nakin. Her tiştên civakê  
pêwîst e ji nû

ve ava bibin. Pircaran pêwîstî bi avasaziya tiştan derdikeve pêş, tiştên  
damezirandinê

pircaran tenê bi damezirandinê dimînin. Saziyên tînd damezirandinê  
pêwîst in lê piranî ji bo

duwarojê ne. Avakirina saziyan têr nake, ji wan re pispor jî divên.  
Pisporên me gelek kê m in;

kê mahiya wan rê dide kesên nepispor, kesên nezan.

SOKRATES: Tedbîr ji bo piştî şoreşê? Bi rastî ev gelek girîng e. Lê mîna hun  
dibêjin zor

e, bi vê zoriyê hunê çawa serî derkevin?

SEROK: Ez naxwazim li ser giş beşan rawestim. Niha li ser pîremêr û hin  
saziyan lê bi

rastî jî, pir kes zehmetiyên me fam nakin. Ji min re şikayetên wisa tînd ku  
zarok pê dikenin.

Ma ez nizanim bi şoreşekê re kar meşandin zor e. Pir kes derdên xwe ji  
min re not dîkin lê

perspektîf û plan nanivîsin. Bi ciwanan re xebat zor e lê xweş e jî.  
Pîremêrên me bi ciwanan

re mîna heval naxebitin, ew ji wan rêzdarî hevî dîkin. Mîna ku kê masiyên  
ciwanan dibînin



yên dijmin nabînin. Tu dibêjî qey dixwazin heyfa xwe ji ciwanên Kurd hildin mîna ku ew

dora xebatê ji wan girtibin. Ma ew beriya van ciwanan nebûn? Çima tiştê nebirine serî?

Ez qebûl dikim ku ciwanên me gelek xeletiyên dikin, kêmasiyên wan hene...

SOKRATES: Xeletî nekin, kêmasî nekin çima ew ciwan in? Bila ew keftar ciwaniya xwe

bînin bîra xwe ka çi kurt û kêmasiyên kirine, çi guzan şikandine!

SEROK: Ew ne tenê li hember ciwanan wisa dikin. Pîremêr giş li dijî hev in. Tiştê ku ez jê

gelek aciz dibim jî ew e ku emrê wan ji 50, 60 bihuriye lê mîna zarokan bi hev dikevin, li

hember hev dexesiyê dikin. Gava tu xeletiyên wan didî rûyê wan, çewtiya xwe bi tund

diparêzin; gava rê ji parastina çewtiyên wan re nemîne, îcar xwe li dîniyê dikin, serê xwe li

heft dîwaran dixin, bexşandina xwe dixwazin, çend roj şun ve dîsa dikevin wê rewşê.

SOKRATES: Eger ew dîn in, çima naçin nabin bela serê dijmin, çima nakevin ciyê dînan?

SEROK: Nizanim, gelo ciyê wan di nav dînan de heye? Ew dînen aqilê xwe ne, xwezî bi rastî

dîn bana.

SOKRATES: Ez nizanim çima; bi xwe keftar im lê ji wan hez nakim? Di ser û dilê xwe de

keftarî qebûl nakim. Birêz Serok vekirî bibêje, tu min mîna keftarekî çawa dibînî?

SEROK: Tu xortekî 18 salî yî, çi keftar!

SOKRATES: Spas, ji kerema xwe re, li pêş Xantippe jî, wisa bibêje! Gelo rast e, gava laşê

mirov dirize giyana mirov jî, dirize?

SEROK: Li gor şagirtê te Platon dibêje, fikrê te mirin û pîrbûna giyanê qebûl nake. Li gor te

giyan û raman namirin, narizên, ne wisa ye?

SOKRATES: Mirov dimire, raman û giyan jê derdikevin li hewayê li ciyekî dinyayê dijîn

wiha dibêje Platon ne?

SEROK: Tiştêk wisa!

SOKRATES: Ev Platon jî, bi destûra te, pistepist kiriye zanyarî. Min bi hezaran car tiştên

wiha û newiha gotine, ew tenê bi dûvika vî tiştî girtiye. Dînek kevirek avêtiye binê bîrê, sed

zanyar dernexistine; piştî Platon her kes rabû li ser gotinên wî, rexne li min girt yan parast.

Ma problemên civaka me ji yên we kêmtir in? Yek bi navê Aristoteles derket hertiştî

qilopanî kir û mîna rêzê têkûz kir, ma mirov raman û giyan dixê rêzê? Tu pêwendiya min pê

tune dîsa gava qala fîlosofî dibe, navê min pir zêde derbas dikan. Heta fîlosofî du beş dikan,

berî min û piştî min. Ez rebenê xwedê, ma min tiştêk nivîsiye? Na, ez nivîs nizanibûm. Em

diçûn Agora, me ji xwe re sohbet dikir, nizanim çima ew bêbextî giş li ser navê min

çêbûn, ma keftarê me ji yên we çêtir in, ma ciwanên me ji yên we çêtir in!

SEROK: Xem nake birêz Sokrates. Tiştên bi navê te tîn kirin ewqas ne xirab in. Ez peyva

yên xwe bikim, tê nikaribî sohbeta xwe bidomînî. Ez tenê hin mînakên biçûk bidim; ji ber ku

dema min tune, dêvla nivîs bi dev dibêjim, ciwanên me digrin kasetê, paşê jê derdixin

dinivîsînin ser kaxiz. Dema min nîne bixwînim, îcar ew peyv dibin pirtûk. Carna ku dem

dibînim li pirtûkên bi navê xwe dinêrim, dimînim ecêbmayî. Pir kes tîn ba min, kî tê teyîb û

pênûs di dest de ne, makîna sûretan jî tînin, sûretên xwe bi min re digrin û pirsan dikin. Piranî

nizanin çî bipirsin jî. Dema carekî din vedigerin ciyê jê hatine, kes nikare ji wan re tiştêkî

bibêje. Bi navê min bê destûra min şûr digrin destên xwe û kî neçe xweşa wan li serî

didin. Gelek ciwanên me yên bi şûr hene, hemû şûrên min li hember hev pêk tînin; îcar

karibin jî!.. 'ûrê xwe ez bi kar naynim, heta xebera min jê dibe pircaran kesek namîne ku ji

şûr filitîbe!

SOKRATES: Na, min tehamul nedikir. Min nedihîşt kes sûretên min bigre û ji min pirsan

bike. Ez bi xwe pir pirsan dikim û li bersivan digirim. Ew aletên tu dibêjî di dema me de hîn

tunebûn, baş ku tunebûn. Dibêjin aletin hene ku mirov tê de tiştan temaşe dike, gava

dipeyive hevdu dibîne ûwd. Rast e ku makînên ji bayê zûtir diçin hene?

SEROK: Ba çi ye, makînên ji deng zûtir diçin hene!

SOKRATES: Belkî mirovên mîna makînan jî çêbikin daku kes bi kesî re nepeyive!

SEROK: Makîne şûna mirovan ji zû ve girtine, têkiliya mirovan bi makînan re, ji têkiliya bi

mirovan re zêdetir e. Li Ewropa pir kes tenê ne, nazewicin bi jin û mêrên naylon re dijîn.

SOKRATES: Hun nikarin ji dêvla pîremêran hin makîneyan deynin û ji wan re minet nekin?

Carna henek serê min vedike. Di vê pêşveçûnê de hîn Kurd bindest in û ne xwediye

welatekî azad in; ev rewş pozê van Kurdên birêz naşewitîne?

SEROK: Bawer im yê hinek ji wan carna dişewitîne. Kurdên em li ser dipeyivin yê baş

in.

SOKRATES: Eger ev baş in, yê nebaş çawa ne?

SEROK: Yê nebaş nebaş in. Nebaşên nebaşan jî hene. Ez ferq naxim nav Kurdan, ji

Kurdên jîr û zîrek hez dikim. Ez ji Kurdên bi giyan û raman kole nefret dikim. 'erê min hertim

li dijî koletiyê ye lê koletiya bi dil ya herî xirab e. Em li vê derê peyva pîremêrên ku di dil û

mejiyên wan de hin ronahî mane dikin. Ez pêwîstî nabînim ku mirov peyva Kurdên peyayên

biyaniyan e, bîne ziman.

SOKRATES: Peyayên biyaniyan ji xwe peyayên biyaniyan e, ma çi têkiliya wan bi Kurdan

re heye, yan çi daweya wan bi Kurdan re heye?

SEROK: Peyayên biyaniyan bi ser de jî, ji xwe gelek razî ne. Ew ji bo mafê xwe yên biyanî

welatperweriyê nadin tukesî. Welatparêziya wan firotina nirxên Kurdan e. Di wan de tu nirx

nemaye ku bifroşin, kes qiruşek jî nade bi wan, ew di quncikên tarî de bazariya xwîna

Kurdên têkoşer dikin. Ger em carekî din vegerin mijara xwe, ez dikarim bêjim, pêwîstî pê

heye ku ew Kurdên dilpak li dora tevgera rizgariya netewî rewşa xwe heroroj di bin çav re

derbas bikin; destê xwe bidin ser wîjdana xwe ka ew çi ava û çi xira kirine. Heroroj

muhasebeya wîjdanê di mirov de dilpakî û baweriya kesayetî xurt dike. Ne tenê pîremêr, divê

ciwan û kesên din jî, hertim vê muhasebeya wîjdanî bikin.

SOKRATES: Bê muhasebeya wîjdanî ferq di navbera mirov û lawir de dimîne?

SEROK: Ne tenê mirov muhasebe bike, herwisa çareyan jî, bigere û bibîne. Divê mirov li

dijî kêmasî û şaşiyên xwe hîn tûj û tund be. Ez hertim dikarim şaşî û kêmasiyên hevalên

xwe ef bikim lê yên xwe tucar ef nakim. Divê mirov dijminê xwe jî, ef bike lê xwe ef neke.

Efa çewtî, kêmasî û neheqiya xwe gerek mirov di jiyane de bine cî. Pîremêrên me serê xwe

wisa berjor kirine ku tenê çewtiyên dervayê xwe dibînin. Ew serê xwe piçek ber bi xwe

vegerînin wê ji şaşî û kêmasiyên xwe bitirsin, ji ber vê yekê ye li xwe nanêrin.

SOKRATES: Dibe ku haya wan ji wan bi xwe tunebe! Mirov nikare odeyek tijî eynik bike û

wan yek bi yek tê de derbas bike daku ew di eynikê de xwe bibînin?

SEROK: Kesek nexwaze bibîne tu eynik bixî nav zikê wî jî, qebûl nake.

SOKRATES: Aletek tune ku gava yek çewtî, kêmasî û neheqî dike bîne bîra wî?

SEROK: Heye: Wîjdan.

SOKRATES: Di dema we de jiyana bûye makîne, nebe ku wîjdana mirovan jî êdî bê makîne

naxebite?

SEROK: Kurdên di nav makînan de dijîn lê di dema we de mirov ji makînan çî fam dikir,

hema hema ewqas jê fam dikin! Lê henekên xwe zêde neke birêz Sokrates, dema me kin e.

Divê ez hîn bi hin ji wan pîremêran re bipeyivim ku kar hîn bêtir tevlihev nekin.

SOKRATES: Ji kerema xwe silavên min li wan bike û rica min ji wan bila pir ezîtî nekin.

Ezîtî civakan difelişîne, kesayetî teng dike. Bila ji ciwanên xwe pir hez bikin û xwe bi

qurbana wan bikin ku ciwan kar û barên ji wan mane hilgirtine ser milên xwe û dimeşînin.

Rûmet û rêzdarî taybetiyên mirovahî yên herî baş û xweş in. Eger kes layiqê wan bin ji bo

van peyvan dem rol nalîze. Bila ciwanên Kurd bi rûmet û rêzdariya xwe pîremêran bidin

fedîkirin. Bila pîremêr jî zanibin ku rûmet û rêzdarî ji keftariyê re nabe.

Divê mirov nebe

keftar û zewzek.

SEROK: Pîremêr dilê xwe ji te negrin baş e.

SOKRATES: Ez li gor dilê kesî şerbetê nadim; kêfa kî ji gotinên min re nayê, bila biçê serê

xwe li heft zinaran bixe.

SEROK: Zû teng nebe, te hîn ji wan kes nenasîne jî...

SOKRATES: Bi rastî tu bi sebir î. Min Nalsrazob dîtibû, keftarek antîpatîk bû. Hêviya min

yên din sempatîk in!

SEROK: Te Isvanes û Yasko nas kiribû.

SOKRATES: Belê sohbeta wan gelek xweş bû.

SEROK: Lê ew jî, hertim ne wisa hêsan in. Pircaran divê bi rojan bi wan re li ser tiştan

bipeyivî heta hin tişt zelal bin.

SOKRATES: Sebra te zêde be! Nizanim wekî din çi ji destên min tê?

SEROK: Ji me re sebir û dua bike bes e.

SOKRATES: Bi sebir û dua av ji bîrê hilnakişe!

SEROK: Lê mar ji kunê dedikeve.

SOKRATES: Bi zimanê şêrîn?

SEROK: Sohbetên bi te re serê min taze dike, bîna min fireh dike.

SOKRATES: Sohbetên bi te re zarokiya min tîne bîra min. Tu zanî zarok çawa li ber

mezinan dilerizin gava dipeyivin?

SEROK: Peyva mezin heye lê peyva mezinan tune.

SOKRATES: Kes heye kes e lê kes heye di kesayetiya ronahiyê de ye.

SEROK: Kes heye ne kes e û di ronahiya kesayetiye de ye.

SOKRATES: Kesayetiya bê ronahî tenê kes e?

SEROK: Bi vî awayî kevir jî kes e.

SOKRATES: Ronahiya kevir diçirîsîne ji ronahiya kevirkes ne kêmtir e.

Ronahiya keskevir

di reşiya şevê de çi ye?

SEROK: Reşiya şevê di rojê de çi be ew e.

SOKRATES: Ronî pir e yan tarî?

SEROK: Roniya raman tenê ji tariyê pirtir e. Tarî çavgirtin e lê tariya çavê vekirî ji tariya

tarî tarîtir e. Tariya tarî ji tariya raman ronîtir e.

SOKRATES: Roniya çavê min pêwîst be bigre ji Kurdan re!

SEROK: Roniya dilê te besî Kurdan e, roniya mejiyê te ji dinyayê re pir e.

SOKRATES: Roniya we pêwîstiya roniyê organên dervayî rakiriyê, gelo ez çawa dikarim

xizmeta ciwanên Kurdan bikim, mîna pîremêrek?

Diyalog -X-

"Dil, Êvîn û Îxanet"

SOKRATES

MUSAPOS, ISVANES, EHMEDÊ XANÎ

YASKO, MELE EVDILA û

SEROK

SEROK: Tu li ser "êvîn li ba Kurdan" pirsan dikî. Bersiva pirsê êvînê gelek zor e. Ne tenê li

ba Kurdan, êvîn li her derê bê bersiv e. Lê êvîna herî bê bersiv li ba Kurdan e.



SOKRATES: Kurd êvînê mîna tişteki ku mirov li pey başî û rastiye be, nanirxînin?

SEROK: Li ba piranî Kurdan êvîn û îxanet di nav hev de ne. Carna ew dikevin pey îxanete

dêvla êvînê. Ew êvîna dil û dila bi êvîn mîna hev dinirxînin pircaran. Ez qala hemû Kurdan

nakim, hin ji wan wisa ne. Lê bi gelemperî Kurd ji êvînê tenê tîbûn û birçîbûna goşt,

daxwaza laş fam dikin.

SOKRATES: Ma ew nizanin ku goşt tucar têr nabe heta mirinê? Têrkirina goşt li ser

bingeha jîtîn (înstîkt) e, çi pêwendiya jîtînê bi êvînê heye?

SEROK: Ez vê pirsê bi salan e ji xwe dikim û li bersivan digirim. Bersivên tînim çiqas xurt

bin jî, Kurd tênagîjin. Tu ji Kurdan bipirsî, kes mîna wan ji êvînê fam nake, ew êvîna li

cîhanê xurt kirine, pesna xwe bi êvîna xwe didin lê giş vala ye. Ez pênc quruş nadim êvîna

piranî ji wan.

SOKRATES: Eger ew li pey xweş û başiyê digerin û xweşî di dilê xwe de mîna dila bi

êvîn û êvîna di dil de dibînin, çi xirabî tê de heye? Ma ew êvînê tenê mîna tişteki di laş de

dibînin yan êvîna laş dixin xizmeta êvîna dervayê laş?

SEROK: Ew êvînê piranî di laşê xwe û di laşê dervayê xwe de dibînin.

SOKRATES: Ma ew nizanin ku êvîn ji laş revîn e? Ma ew nizanin ku pêwendiya laş êvînê

vedimirîne û nahêle êvîn nêzîkê mirov be? Ma çi pêwendiya laş bi êvînê re heye; eger hebe

bersiva çawa, çima çawa didin?

SEROK: Bersiva Kurdan mîna tu difikirî ne giran e. Ew di êvînê de fîlosofiyê nabînin,

fîlosofiya êvîna xwe çêdikin. Bi sedan bersiv didin te lê di bersivên wan de bersiv tune.

Bersivên xwe li ser belengaziya xwe û li ser mafê xwe yê şexsî ava dikin. Kurd di rewşa

koletiyê de dijîn, bersivên koleyan nabe, derew û xwe xapandinên wan hene. Mirovê kole

dikare peyva êvînê bîne ziman? Evîn bi xwe ne jahrê koletiyê ye? Kurdên me ji dîliya xwe dil

fam dikin, ji ber vê yekê ji êvîna xwe re dibêjin dîl-ber. Ew li ber tiştan dîl in û vê dîlîtiya

xwe mîna dilhezî û êvînê fam dikin. Di mejiyê koleyan de tenê êvînek heye, ew jî, êvîna dîlî,

ne êvîna dil e. Gava peyva dil tînin ziman, ew qala dilê xwe yê goşt dikin. Dilê goşt dikare

barê êvînê hilgire ser xwe? Ma dilê goşt bi xwe ne di nav laşê mirov de zîndanî ye? Laşê

mirov ji bo dil ne girtîgeh e? Mirov dikare dil mîna dîlê laş binirxîne, lê dil nikare êvînê

temsîl bike. Di êvînê de azadî heye, di êvînê de dilberzî, mezinî, firehî, kûrahî heye.

SOKRATES: Ez bi xwe gihîştina êvînê gelek dûr dibînim. Emrê mirov têr nake ku mirov

bigîje wê dûrahiyê, ne wisa? Mirov dilê xwe ber bi dîlî mîna êvîn bibîne,  
gihîştina êvînê di  
dilê dîl de bibîne, xwe naxapîne? Xwe xapandin berovajiyê êvînê bûn e.  
Ma ew fam nakin ku  
ew xwe bi vî awayî ji êvînê hîn dûr dixînin?  
SEROK: Hin ji wan fam dikin lê xwe dixapînin û hin jî, bi wan dixapin.  
Mînak Dibix û  
Hîvarok. Hîvarok dîl-beriya xwe yanî dîl-diliya xwe mîna êvîn nirxand û  
reviya, yanî ji êvînê  
reviya lê ew dibêje qey bi êvînê re reviya ye. Mirov nikare bi êvînê bireve  
lê mirov dikare ji  
êvînê bireve. Di Kurdan de hev xapandin û revandin bûye kultura rojane.  
Koriz hebû reviya  
xwe spart îxanetê; ew di wê baweriyê de bû ku azad bûye. Bi Koriz re  
Kariz jî xapiya, reviya  
ji êvînê. Her kesê ku xwe ji êvînê direvîne koletiya xwe dipejirîne. Koriz û  
Kariz di hemêza  
dijminên xwe de îxanetê bi azadiya xwe dikin. Maxo li ser azadiyê gelek  
zulum kir bi navê  
êvîna azad; xwe bi vî awayî ji azadiya êvînê dûr xist, çû mala xwe, xwe di  
nav dîwaran de  
hepis kir. Berê ew di girtîgeha dijmin de azad bû, vêga di mala xwe de  
girtî ye. Xansor bi xwe  
gelek bawer bû ku ew ji êvîna giyanê fam dike, bi jineke bêgiyan xwe ji  
êvînê dûr xist. Di nav  
me de gelek kes hene ji êvînê fam nakin û dev ji peyva êvînê jî, bernadin.  
Bi sedan kes hene,

ez naxwazim li vê derê bînim ziman, xwe dixapînin; hin ji wan azadiyê di îxanetê de dibînin,  
hin jî, ketine derdê jiyana koletiya xwe ya bêmane.  
SOKRATES: Ev mînakên balkêş in. Li ba me xortek pir xweşik bi navê Alkibiades hebû,  
êvînê di têrbûna goşt de ditît, hertim bela xwe li min dida û dixwast ez pê re bikevim têkiliya  
laş. Agathon pir xweşik bû lê tenê xweşik bû û xweşikahî pir şeklî digirt. Platon baş  
bû; ew êvîna rastî hinek fam kiribû lê ew jî, êvînê kiribû tiştekî tenê xeyal. Jina min  
Xantippe ji min hez dikir lê têgîştina wê li ser êvînê kêmbû. Meletos rastiya êvînê di  
kuştina min de didît ji ber vê yekê fermana kuştina min da û ez gihîştim êvîna rast.  
Pirsgirêkên Kurdan ji yê me gelek zêdetir in, divê ew hîn êvînê ji nû ve ava bikin. Ji bo  
çareserkirina têgîştina êvînê çi tên kirin?  
SEROK: Em ketine pêvejoka têgîştina êvînê, lê rê hîn dûr e. Li ba me Kurd hene, dest pê  
kirine kulîlkên êvînê li ser çiyên diçînin. Li bajaran hin Kurd di nav xebata têgîştina êvînê  
de ne; dîsa jî, ji min re pirs dûr û dirêj dixuyê. Pir mirovên me yê zana hîn nizanin ew çi  
dizanin yan ew çi nizanin ji ber vê yekê jî, ew dibêjin qey ew hertişt dizanin. Hin ji wan hîn  
nizanin nan bixwin. Nan xwarin destpêkeke kultura mirovahiyê ye lê ew hîn nizanin ferq

bixin nav nan xwarin û êvînê. Gava Kurdên me qala êvînê dikin, piranî mînakên wan li ser xwarinê ne. Jinan mîna tiştên xwarinê dizanin. Dibêjin ev jin mîna sêvê xweş e, lêvên wê kiraz, bejna wê şitil, nizanim rûyê wê hinar, singê wê şîr, nizanim kudera wê petêx û zebeş. Jinan bi spehîtiya xwezayê danberhev baş e. Lê ji xweşikiya xwezayê wisa nakin, ji ber ku jin mîna xwarinê dibînin. Bi heywanan re didin ber hev. Navê heywan û fêkiyan li wan dikin. Li ser mêran jî, tiştên wiha tên ziman. Ez van tiştan ne ji bo rexnekirinê dibêjim, dixwazim şeklek bidim ber çav. Ev ne tenê di kultura Kurdan de wisa ye, di kultura gelên din de jî, wisa ye lê ez dixwazim li ser Kurdan rawestim.

SOKRATES: Eger em carekî din mijara xwe hinek teng bikin û vegerin ser dil û êvînê; ji bo Kurdan giyan çi rol dilîze, rewşa giyana dilêvîn li ser dilêvîna giyanê çi tesîr dike?

Daxwaza dil ji êvînê çi ye, êvîn ji dil çi dixwaze? Dil dixwaze xwe bi êvînê bigre û ji girtîgeha xwe, xwe rizgar bike yan daxwaza wî êvînê bîne ba xwe, bixe girtîgehê? Laş girtîgeha dil e lê giyan azad e. Dil xwe di nav parçeyeke goşt de dîl kiriye; dilê dîl dîltir e yan dîltitiya dil dîltir e?

SEROK: Mirovahî dîroka xwe pir mezin dike, xwe pir mezin dibîne û bi pozbilindî nêzîkê

xwezayê dibe. Xweza dixê bin tesîra xwe lê ew nizane ku ew çiqas  
hukumdariya xwezayê  
bike, ewqas koleyê wê ye. Hukumdar bê kole ne hukumdar e. Ew  
hukumdar e ji ber ku  
koleyên wî hene. Ne kole bê hukumdar ne jî, hukumdar bê kole nabe.  
Kole xwe bi tiştina  
girêdan ferz dibîne. Ev tişt dibe mirovek be, dibe tişteke be. Mirov bi tişteki  
ve neyê  
girêdan, nabe kole. Kole tişt bi xwe nîne, girêdana bi tişteki ve koletî  
peyda dike. Koletî  
girêdan e. Hin kes xwe bi dilê xwe ve girê didin û xwe azad dibînin. Mirov  
ji dilê xwe re jî  
koletî bike, ev koletî ye. Dil di nav parçeyeke goşt de girtî ye, xwe ber dide  
êvînê lê  
naxwaze bi êvînê re bireve, dixwaze êvînê bîne ba xwe û bixe nav  
girtîgeha parçeyeke goşt.  
Dil ji girtîgeha xwe razî ye, fikra gihîştina giyana dervayê goşt tê de tune.  
Ew bi qedera  
xwe ya kole kêfxweş e, serbilind e. Em dixwazin giyana dil li êvînê siwar  
bikin û wî ji nav  
girtîgeha parçeyeke goşt û girtîgeha mezin laş rizgar bikin. Dil ji dîlîtiyê dil  
nake; dil bi  
dîlîtiyê, xwe azad dizane. Dil dîl-ber e. Em dixwazin dil êvîn be, dil bi êvînê  
re li ser ewran  
govendê bigire, ber bi galaksiyan bikeve rê. Dil bibe giyana serfiraziyê.  
Em dilê Kurdan  
bilind dikin, ew çiqas bilind dibin serfiraz dibin; gava ji bilindiyê dikevin  
pir xirab dikevin.

SOKRATES: Eger mirovek pir bilind be, li gor bilindiya wî ketina wî jî, kûr nabe? Gava mirov xwe davêje nav avê, çiqas ji bilindiyê bavêje, ewqas kûr diçe bin avê. Gava mirovên bilind bûne dikevin, ciyê dikevin zêde xisar dibîne, ne wisa?

SEROK: Belê. Mirovek zana berovajî bikî nezaniyê, nezaniya wî ji nezaniya yekî nezan pir zêdetir dibe. Mirovên bilind gava tam bilind nebin, negîjin stêrkan, xetera ketina wan heye. Gava dikevin xirab dikevin. Li gor bilindiya xwe nizm dibin; nizmiya wan xwe digîjîne îxanetê. Mirovê zana îxanetê bike ji mirovê nezan gelek zêdetir zerarê dide. Herkes li gor zana û nezaniya xwe zerarê dide. Nizmiya mirov li gor bilindiya mirov e. Mirov çiqas bilind be ji nizmiyê ewqas dûr e lê mirov çiqas dûrê nizmiyê be ewqas zû dikeve nizmiyê; ger ew vegeêrê dabe ber xwe. Îxaneta Kurdên nezan pir zerar nedaye Kurdan lê îxaneta Kurdên zana pir zerar daye. Mirov nêzîkê azadiyê be, xwe ji koletiyê dûr dibîne. Koletiya mirovê nêzîkê azadiyê ji koletiya mirovê dûrê azadiyê zûtir e, kûrtir e. Mirov azadiyê bibîne û koletiyê hilbijêre, ji mirovê kole sed car koletir e. Mirov bi azadiyê re bimeşe, îxanetê bike erdem, ew mehlûqê herî pîs e, herî bi zerar e. Kesek bi zanayan re dostanî bike û pesna cehaletê bide

mafê wî yê jîyanê tenê newala miriyan e. Di Kurdên me de her meziyet hene.

SOKRATES: Meziyet bi awayê pozîtîv baş e lê meziyet ber bi negatîv birin ne baş e.

Meziyet negatîv dibe, bibe ew dîsa meziyet e yan na? Mirov çima li pey meziyet, mafê rast û

başıya giyan direve, çima li azadiyê digere, çima ketiye pey tiştina?

SEROK: Va hin Kurdên din jî hatin, em dikarin sohbeta xwe bi hev re bidomînin. Tu

hemûyan dinasî.

SOKRATES: Birêz Isvanes, Yasko, Ehmedê Xanî hun bi xêr hatin. Lê min ew her du

camêrên din nas nekirin.

SEROK: Te pir dixwast tu yekî ji wan bibînî; ev Mûsapos, ev jî, birêz Mele Evdila.

SOKRATES: Ev ji bo min surprîzeke mezin e, pir kêfxweş bûm, kerem bikin. Birêz

Mûsapos mamosteyê me hemûyan e, ji aliyê etîka raman.

MÛSAPOS: Haşa bavê min, tu pîrê me yî. Em hatin guh bidin sohbeta we, em naxwazin bi

xwe zêde bipeyivin.

YASKO: Bê nukteyên te yê xweş tama sohbet nabe.

SEROK: Sohbeta me li ser dil, êvîn û îxanet e.

MÛSAPOS: Li ser dil û êvîn em nikarin pir tiştan bibêjin lê li ser îxanetê em pir zanin ji ber

ku dîroka me bi îxanet û koletiyê derbas bûye.

ISVANES: Emê behs bikin. Azadî, dil, êvîn lê ez dixwazim guhdarî bikim.



MELE EVDILA: Ciyê ilim û îrfan hebe ez ji guhdarkirinê re gelek jîr im, lê ne ji peyvê re.

Em mele li camiyan ewqas dipeyivin tiştêk naçe ser, ne pêwîst e em li pêş zanayan jî

bipeyivin. Peyvên me meleyan ji bo cahilan e. Ciyê zana lê bin divê em bêdeng bin.

SOKRATES: Kurd çiqas kîbar û mutewazî ne.

SEROK: Kurd dîsa dest bi kîbariyê kirin. Bi gotinan nabe birêz Sokrates, mereq neke ewê

gelek bipeyivin. Tu hîn fêrî Kurdan nebûyî, ew bi kîbariyê gotin di dile xwe de nahêlin.

MÛSAPOS: Ma em devê xwe bi carekî ve nagirin Serokê hêja; me got em zêde napeyivin,

me negot em ji kok napeyivin. Ne wisa mamoste Xanî.

EHMEDÊ XANÎ: Xanî ji kemalê bê kemalî, meydanê kemalê bibîne xalî, yanî ne ji qabil û

xebirî, pêwîst bidîta zêde dipeyivî.

SEROK: Hun mele baş in lê başî têrî gihîştina êvînê dike? Mele êvînê tînin ziman lê di

jiyanê de êvîn çî ye? ev e pirs.

EHMEDÊ XANÎ: Ger dê hebûya me padîşahek, layiq bidiya xwedê kulahek, tayîn bibûya ji

bo wî textek, zahir vedibû ji bo me bextek, hasil bibûya ji bo wî tacek, helbette dibû me jî

rewacek.

SEROK: Ji xwe pirsgirêk di vê derê de ye. We çima ji xwe re tacek danenî, nebûn xwedîmaf

mîna netewên din? Birêz Xanî hun li pey êvîna rast bûn, bi êvîna rast  
reviyan lê rewş nehîşt

ku hun êvîna xwe bikin êvîna jiyane, êvîna jiyana netewek! Em dikarin  
bidomînin. Birêz

Sokrates fermo hun ji pirsan dakevin bersivan.

SOKRATES: Giş emrê min li pey êvîna serfiraz, azadiya dilberz derbas bû.

Di dema me de

mirovahî di konaxeke teng û paş de bû. Kêm kes li pey êvîna berz  
digeriyan.

MÛSAPOS: Xem nexwe bavê min, di dema me de mirovahî di wê hêlê de  
ji dema we ne

pêşvetir e. Mirovahî piştî kuştina we dev ji lêgerîna erdem û dilberziyê  
berneda lê zêde jî,

pêş ve neçû. Pêşveçûna teknîk mirovan hîn egoîst kir. Herkes xwast ku  
ew zêde feyde ji

tiştan bigire; mirov bû derewkar. Camêrî nema, qeleşî dest pê kir. Qiweta  
kî hebû, qiymeta

wî zêde bû. Mirov ji aliyê raman jî, gelek pêş ve çû; ramana xwe xist  
xizmeta mafê xwe yê

şexsî. Hin kes kom bûn, hêzek ava kirin û zulum li yê din kirin, erdê wan,  
nanê wan ji destê

wan girtin. Paşê pir sînor pir kişandin, dewlet çêkirin. Hertîşt bû zêde  
parastina mafê

EZÎ. Hin kes bi qiweta raman hin bi qiweta dest û çek, teknîk û komên  
leşkerî zulum li yê

din kirin. Erdê mirovahî parçe parçe par ve bû, jiyana hin kesan bi yê din  
ve hat girêdan.

Barbar û mêrkuj bûn xwediyê afirankarên kultur, kesên xwedîkultur bûn kole. Ez çî bêjim,

bi rojan bêjim naqede. Em Kurd jî, bûn çîrokvan.

SOKRATES: çawa, çima çîrokvan?

MÛSAPOS: Ji ber ku milletên din giş kar di nav xwe de par ve kirin, ji me re jî, tenê

çîrokgotin ma!

SEROK: Birêz Sokrates, tu hîn fêrî henekên birêz Mûsapos nebûyî, ew ji derdên dilê xwe

bûye henekvan, mirovan dikenîne, di nav henekên wî de ders tijî ne.

MÛSAPOS: Em dixwazin hun ji me re fikrê xwe li ser êvînê bibêjin birêz Sokrates.

SOKRATES: Ez êvînê nas nakim, tiştêkî ku ez nas nekim, çawa li ser fikrê xwe bibêjim?

SEROK: Hun jî, metod û edetên Sokrates nizanin, ew hertim bi nezanbûna xwe ya li ser tişt

dest pê dike; paşê pirsan zelal dike.

MÛSAPOS: Wê demê tiştên hûn nizanin ji me re bibêjin bavê min, ezbenî.

SOKRATES: Berê min digot qey êvîn hezbûn e, ne hezkirin e. Lê êvîn ne hezbûn û ne

hezkirin e, di navbera herduyan de ye. Min digot qey êvîn tenê xweşik e.

Eger evîn xweşik

be, kesê xweşikahiyê bixwaze, çî dixwaze? Dixwaze xweşikahî jê re be.

Baş e,

xweşikahî jê re be, çî dibe? Ger em dêvla xweşikahî başî bigrin, kesê daxwaza başiyê

bike, dixwaze bigîje başiyê. Bigîje başiyê çî dibe? Ew dibe bextewar.

Bextiyarî ji

bextewaran re bextiyarî ye. Li vê derê bersiva çima tune, ne pêwîst e jî.  
Evîn lêgerîna

başiyê ye. Mirov başiyê nebîne hertim xirab dimîne, nagîjê êvînê.

Lêgerîna başiyê ne ji bo

dîtina wê ye, lêgerîna wê bi xwe êvîn e. Mirov hertim li pey başiyê nebe  
nagîje êvînê;

gihîştina êvînê, başiyê ji holê radike, divê mirov ji pey başiyê, ji pey êvînê  
neqete.

SEROK: Gava mirov li pey başiyê digere, rastî hin xapînokan tê û dev ji  
lêgerînê ber dide,

xwe davêje ser tiştê ku dîtîye, dibêje qey gihîştîye êvînê. Bi vê  
xwexapandinê nahese û

tiştê herî xirab jî, naxwaze pê bihese.

SOKRATES: Hemû mirov bi bereket in, hem ji aliyê jiyânê hem ji aliyê  
giyanê. Ber bi emrê

dirêj, xwezayê mirov bereketa xwe ya laş winda dike. Mirov tenê di  
spehiyê de bi bereket e,

nikare di nespehiyê de bizê û bizayîne.

YASKO: Êvîn xwe dide ser çi bingehê, ne ser xweşikiyê?

SOKRATES: Ne tenê, xwe dide ser afirandin û zayîn di xweşikiyê de.

YASKO: Afirandina çi, çawa?

SOKRATES: Ji ber ku afirandina zayînê her bêdawî ye û bêmirin e; ma di  
mirinê de jî, ne

wisa ye? Kedrijiya pey bêmirinê bi başî re, ger êvîn bi ser de biçê jî, hertim  
xwedîbûna

başiyê ye. Li gor vê êvîn jî, xwe dide ser bêmiriniyê. Bi başiyê re kedrijî ji  
bo nemiriniyê,

têkçûna êvînê bi xwe re bîne jî, pêwîstî ye. Lê êvîn xwe dide ser bêmiriniyê ji ber vê jî, di

mirinê de be jî, jîn dide. Mirin siya xwe deyne ser êvînê, ew mirin bi xwe vedije, xwe ji holê

radike. Ma ciyê êvîn hebe mirin dikare bijî?

SEROK: Ciyê mirin hebe êvîn konê xwe digre û bar dike, diçe ciyê bêmirin.

Hertim ciyê ku

êvîn li wê derê xuya bike, mirin konê xwe ji wê derê radike. Ew ji hev ewqas dûr in ku di nav

hev de ne, ewqas di nav hev de ne ku nagîjin hev.

ISVANES: Lê berdewamiya jiyânê xwe di çi de diyar dike, tiştê dijî çawa ciwaniya êvînê

didomîne?

SOKRATES: Ciwanî li ser kalî, nû li ser kevn ava nabe? Jiyân xwe ji mirinê ber bi bêmirinê

nabe? Jiyân ber bi pîriyê, gava xwe qels dibîne çi dike, xwe nade ser zindîbûnê? Ev zîndîbûn

ne êvîn e, ne jiyaneke nû ye? Di giş mehuqan de rewşa xwenûkirin, nûzan û li ser jiyana

nû êvîn û li ser êvîn nûvejîn pêk nayê? Bi vê pêkhatinê nîne ku afirandina jiyânê berdewam e?

Di xweza de her beş û beşer xwe ji bo berdewamiya jiyana xwe bi êvînê naxemilîne, êvîn

hertim jiyana nû navejîne? Pey êvînê bûn bê ked dibe, ciyê ked lê hebe êvîn çênabe? Ciyê

êvîn lê çêdibe bi xwe ne jiyân e?

YASKO: Ev rewş xwe di rastiyê de wisa dilîvîne, mîna tê gotin?

SOKRATES: Em bêjin mirov bi aqil xwe dilîvîne, ji ber vê yekê wisa dike; emê li ser

heywanan çi bêjin? Ew ji bo jiyane bidomînin êvîne pêk naynin lê di êvîne de dafdanekê

navîn heye ku zindî dixê pey xwe. Jitîn (instikt) jê re tê gotin û bê wê afirandina jiyane ne

mumkun e. Pir aliyên êvîne hîn jî, xwe didin ser jîtîne, ji ber vê yekê carna ferq di navbera

mirov û heywanan de namîne. Mirov êvîne li ser bingehêke maqûl pêk neyne çi ferqa wî ji

heywanan dimîne?

YASKO: Lê ferq di nav mirov û heywan de divê hebe!

SOKRATES: Nizanim. Mirov xwe bi aqil dilîvîne, bi plan û hesab. Ji xwe re hin sedemên

ehlaqî peyda kirine. Piştî mirîne bi bêmirîne bawer e, ji bo bêmirîniya navê xwe dikare

bimre. Ev meziyetên mirovahî ne, heywan piştî-mirîne plan nake, ne li pey navê xwe ye; li

gor jîtîne xwe dilîvîne. Carna mirov û heywan mîna hev bixuyên jî, dîsa ferq di nav wan de

heye; mirov hertim bi plan e, ne wisa?

SEROK: Hun bi giranî li ser êvîn û afirandina laşî radiwestin, afirandina giyan û raman,

êvîna giyan û raman...

SOKRATES: Ferqa herî mezin di nav mirov û heywan de, ne ew e ku mirov li pey afirandina

giyan û raman e jî?

YASKO: Afirandina giyan û raman çi ye, ew çi dikarin biafirînin?

SOKRATES: Me qala êvîna etîk û raman kiribû, bê etîka mirov afirandina jiyaneke dibe jiyana

mirov? Afirandina giyan û raman zanyarî, huner, musîk û giş tiştên xweşik in, bê wan

jiyan dibe? Bê wan jiyana mirov çi jiyaneke e, êvîn çi êvîn e? Bê berhemên raman û giyan

wekhevî, rastî, adalet çêdibe? Azadî, heza mirov û xweza, perwerdeya ehlaq û moral

çêdibe? Spehî, xweşikahî û başî di giyan û raman de nebe di laş de dibe? Bê giyan

spehiya laş çi ye? Kesê êvînê diafirîne dikeve pey laşê bê giyan? Di laşekî bê giyan de

êvîn pêk tê? Xweşikahî dikare bê afirandin?

ISVANES: Mirov çawa dikare bigîje xweşikahî, bê ku bi xweşikahiya laş bixape? Ferqa

xweşikahiya laş û giyan xwe di çi de diyar dike, rê çi ye ji bo mirov bi êvîna xweş û

baş re bimeşe?

SOKRATES: Xweşik û nexweşik xwe bi dîtina ji derva diyar dike? Carna xweşikahî di

laşekî de ye ku ji derva spehî naxuyê. Di hemû mirovan de xweşikahî heye, perwerdeya

piştî zayinê dikare rê li ber wê bigre. Divê mirov bi xortanî bikeve pey başî û xweşikahiyê

û di ciwanîyê de xweşikahî bi êvînê bigijîne; bê ked êvîn çênabe, bê êvîn xweşikahî pêk

nayê, bê xweşikahî başî nayê afirandin û bê afirandina bilind giyan û raman zanayî û

dilberzî peyda nakin. Girîngiya giyan û raman rê li ber êvînê veke,  
pêwîstiya tirsê ji  
nexweşikahiyê namîne. Divê mirov xwe pir nede pey spehiya laş, spehiya  
laş li pey  
spehiya giyan e. Di giyana spehî de afirandina jiyana û êvînê dilberziya  
gihîştina başiyê ye  
jî. Bi jiyana giyanê azadiya serbilindî divê, ji ber ku êvîn û jiyana, xweşikahî  
û başî di  
koletiyê de jîn nadin.

SEROK: Tiştê ku li vê derê ji bîr nebe ev e ku xweşikahî li gor kî, li gor çi?  
Kî çawa

spehîti tayîn dike, çi li gor kî xweş û baş e?

SOKRATES: Pêwîst e li ser vê yekê bi taybetî bê rawestin. Hêviya min tu  
bikevî peyvê li gor

rewşa nû; ma bê pinta(niqte) mirov lê ye peyva spehî, başî, giyana  
dilberz, êvîna jiyana

mane îfade dikin? Ma xweşikahî ne dureyek e diberiqe, berîqîna xwe şanî  
herkesî nake?

Spehî neberiqe, çiruskên wê em ronî nekin, ne bê mane ye?

SEROK: Belê, min dixwast em der û dora mijarê hinek fireh bikin daku em  
karibin firehiyê

ber bi tengbûneke têgîştinê ve bînin. Hun gelek li ser afirandin û zayînê  
peyvîn. Afirandina

zayînê di spehîtiyê de. Afirandina zayînê di spehîtiyê de be jî, bê parastina  
wê, çi mane îfade

dike?

SOKRATES: Bê parastina spehîtiyê zayîn dikare tê de bê afirandin?



SEROK: Pirseke girîng e parastin. Parastina zayînê dema afirandinê di xweşikahiyê de bê

serfiraziya mejiyê azad dibe? Mejiyê azad çiqas ji koletiyê dûr e yan ew di nav koletiyê de

azad e? Koletî dikare azadiyê di nav xwe de biparêze?

SOKRATES: Bersivên pirsên tu dikî gelek girîng in. Koletî dikare xwe li pêş êvîn û azadiyê

bixe asteng? Azadiya ku koletiyê ji astengbûnê dernexe dikare wisa bê binavkirin?

MÛSAPOS: Hun pirsan gelek dirêj bikin wê kî bersivan bide? Koletiya hun qal dikin çi

koletî ye? Eger hun qala koletiya me Kurdan dikin, ez dikarim ji we re bersivan bidim lê

bawer im hun gelek kûr diçin; em rebenên xwedê çawa bi têgihîştinê zelal bin?

SEROK: Hun çend rengên koletiyê dinasin birêz Mûsapos? Koletî xwediyê rengan e yan

reng di koletiyê de hene? Têkiliya koletiyê bi tarî yan bi ronahiyê re zêdetir e?

SOKRATES: Kole pir in yan koledar? Ferqa kole û koledaran heye, hebe çi ye? Têkiliya

êvîn bi koletiyê, têkiliya dil bi koledariyê ve heye?

SEROK: Kole çiqas xayîn e? Koledar ji azadiyê çi fam dike? Bê koletî azadî, bê koledar

serfirazî çi ye? Evîna serfiraz di koletiyê de çiqas îxanet e? Parastina koletiyê yan

neparastina azadiyê xirabtir e? Parastina êvînê ber bi laş, parastina dil di laş de çiqas azad

e, çiqas kole ye? Mafê êvînê heye? Mafê koletiyê heye? Kîjan maf li dijî xwe zêde dixebite?

MELE EVDILA: Tiştê ez pir meraq dikim, hun li ser zebaniyan çi difikirin?

Zebanî kole ne

yan na? Eger kole bin, mafê koleyan heye bikevin bihiştê yan na? Hûrî li bihiştê azad in

yan kole ne? Eger ew kole bin, gelo mafê min heye ku ez hûriyan red bikim? Mafê redkirinê

nedin min, dikarim li bihiştê bimînim yan na?

MÛSAPOS: Lawo Mele Evdila tu van pirsên xwe çima ji me dikî, biçe mesela xwe bi

xwedayê xwe re çareser bike. Ma em çi zanin ka di bihiştê te de êvîn û maf çawa ye? Ez

bi xwe li bihiştê me lê heta niha min tu hûrî nedîtine.

MELE EVDILA: Mesela min jî, ji xwe ev e, ka digotin li wê dinyayê çil hûrî didin; hîn

nedane min, lê dema hûrî bîn, ez çi bikim?

SEROK: Em hîn nikarin pirsên vê dinyayê zelal bikin, îcar hun çûn ser pirsên dinyayeke

din!

YASKO: Xelk ji bo jinek xwe ji azadiyê paş ve dikêşîne, Mele Evdila jî, dixwaze xwe ji çil

hûriyên bihiştê rizgar bike.

SOKRATES: Bihişt li kuderê ye, welatê kî ye?

SEROK: Ev pirs û bersivên van tiştan dirêjin, em vegehin ser mijara xwe, ji bo henekan

dema me kême.

ISVANES: Lê pirsên Mele girîng in, ew divê bizane diçe kuderê.

MÛSAPOS: Ciyê nizane bila neçê. Emê ji kuderê zanibin, ewê biçê kuderê?

MELE EVDILA: Bavo min pirsên xwe paş ve girtin. Ez bersivên pirsên xwe zanim, spas.

Em vegerin mijara xwe lê pirsên min jî, ji mijarê ewqas dûr nînin.

SOKRATES: Birêz Mele Evdila hun naxwazin neçin wê derê. Ma pêwîst e hun biçin ciyekî

ku dilê we naxwaze?

SEROK: Em li ser parastina afirandina zayînê di êvîna xweşikahiyê de mabûn. Bê parastin

êvîn nabe, kesê êvînê dil dike, divê parastina wê jî bigre ser xwe. Giş xebata me li ser

parastina azadiya êvînê ye lê hîn êvîn xwe serfiraz nekiriye hin kes dixwazin pê bilîzin.

SOKRATES: Bi êvînê lîstin, çawa yanî? Kî dikare bi êvînê bilîze, bi çi cesaretî?

SEROK: Cesareta nezaniyê. Nezanî pir bê cesaret û bê hesab e. Berê dike, paşê difikire,

poşman dibe lê poşmanî dereng e.

SOKRATES: Qiwet digîje ku mirov bi êvînê bilîze?

SEROK: Qiweta tu kesî nagîjê lê diceribînin. Bi êvînê lîstin, bi jiyane lîstin e, bi azadiyê lîstin

e, kes nikare.

SOKRATES: Kî bi êvînê bilîze, gelo ew bi xwe nalîze?

SEROK: Pir kes ji bixwelîstinê ne aciz in.

SOKRATES: Ew çi kes in ku bi xwe û bi êvîna xwe dilîzin?

SEROK: Ew çi deng e, dîsa bang li min dîkin, divê ez biçim...

SOKRATES: Gelo çi bûye?

SEROK: Ez bawer im dîsa hin kes teng mane, nikarin xwe ji lîstika êvîne ber bi êvîna jiyanê bi reê ve bibin. Di eniya şer de tişt heye, wekî din bang li min nedikirin. Hun sohbeta xwe bidomînin, ezê paş ve bêm.

YASKO: Birêz Serok diçe, em çi bikin?

ISVANES: Heta ew bê em dikarin sohbeta xwe bi Sokrates re bidomînin.

MUSAPOS: Baş e, em pirsra Mele Evdila zelal bikin, mesela wî û êvîna li bihiştê, ka mirov

dikare li wê derê bi êvînê re bilîze yan na?

MELE EVDILA: Serok çû, lê ka Sokrates?

YASKO: Sokrates jî, winda bû...

MUSAPOS: Ez bawer im ku bê Serok em nikarin bi Sokrates re bipeyivin ji ber ku ew ji me

gelek dûr e û em mesafeya di nav xwe de nikarin bigîjînin hev.

ISVANES: Vêga baş fam dikim. Dema Serok çu, Sokrates mîna sir ji holê winda bû.

MELE EVDILA: Em nikarin sohbeta xwe bidomînin?

YASKO: Kekê Mûsapos jî, winda bû.

ISVANES: Ka Mele Evdila, ne vêga li kêleka min bû.

YASKO: Ez bawer im, bê Serok em nikarin bi wan re jî, têkilî deynin.

ISVANES: Em tenê man. Em carekî din li ser mijarê bipeyivin çêtir e.

EPÎLOG

SOKRATES: Em van diyalogan bipejirînin yan na?

SEROK: Ez dibêjim pejirandina me bila li ser nirxandina bîr û raya giştî be.

SOKRATES: Bîr û raya giştî hîn demokratir e lê haya wan ji sohbeta me nîne. Ew tenê

tiştên ku ji hêla nivîskar pêşkêş bûne, dinase.

SEROK: Em dikarin carekî din giş diyalogan di ber çav re derbas bikin, ciyên ne bi dilê me bin, nepejirînin. Ez bi xwe ji ramanên azad, ger ew li dijî min bin jî, aciz nabim lê mafê min heye ku ez jî, bi awayekî li dijî wan ramanan rawestim.

SOKRATES: Nizanim. Ez bi xwe fêrî wan tiştan bûme ku kes bê xebera min li ser min, bi navê min binivîsînin, ne bi dilê min bin jî, fikrê wan e. Ma Platon ji nivîskarê vê pirtûkê kêmtir û çêtir kiriye, ew min daye naskirin bê haya min.

SEROK: Xenophon jî, li ser te bîranînên xwe nivîsandibûn.

SOKRATES: Tiştên Xenophon ji yên Platon nêzîktirê jiyana min in. Lê ez li ser nivîsên nivîskarê Kurd naxwazim pir qarqarokî bikim. Ew hîn xort e, dibe ku şaşiyên bike, tişt nabe.

SEROK: Birêz Sokrates me gotibû, em rûmetê nadin temenê mirov...

SOKRATES: Nizanim, bawer im ew jî, fikrê nivîskar bû, bi me dabû gotin. Ez baş dibînim ku bîr û raya giştî çawa dixwaze bila wisa binirxîne. Em mafê xwe yê parastinê nedine wan?

SEROK: Ez hînê gelek tiştên wisa bûme. Baş e, em vê rûpelê wisa bihêlin, bila vekirî bimîne. Em rabin nivîskar rexne bikin, dibe ku hinek şaş fam bikin û hewesa kesên din bişkê. Ya rastî ez naxwazim hewesa nivîskarên Kurd bişkînim, ji ber ku yên bi Kurdî

dinivîsînin bi hejmara tiliyan e. Tu çi dibêjî, em Diyalogên vî camêrî wisa bihêlin?

SOKRATES: Em nehêlin jî, ewê mîna xwe bike û gotinan li gor hêza pênuşê bi me bide gotin.

SEROK: Baş e, em rê li ber nivîskaran vekirî bihêlin!

SOKRATES: Daku cesaretê nivîskarên din neşkê, ew jî, ramana xwe azad binivîsînin?

SEROK: Rast e..

serî malper

\*\*

## ŞEVÊN ZENGÎN

Çîrokên gelêrî

Newafê Gedo

[www.tirej.info](http://www.tirej.info) [www.tirej.name](http://www.tirej.name)

-4-

Pêşgotin

Newafê Gedo kiye?....

Ew Newafê Silêmanê Gedo ye di sala 1938 an de li gundê Dodan hatiye dinê

,û Tevaya jiyana xwe ya zarokî li wir bûrandiye .Ta ku bûye xort, xortekî kurd – Perwer , heskirina welatê wî û milletê wî beşekî mezin ji dilê wî girtiye takû wê heskîrnê hiştiye kû ew tevî rîzên tevgera kurd li Sûriyê bibe

û di sala 1972 an de weke endamekî hatiye bijartin û çûye kongira netewî kurd li , bamernê , li kurdistan , Îraqê , beşdar bûye piştî ji Kurdistanê ziviriye bi demeke ne dirêj berê xwe daye, Beyrûdê , ji bo bidest xistina qûtê

zarokên xwe û dibere jî jibo tevlihbûna karê siyasî ji bo doza gelê xwe, piştî pênc salan li wir maye û dûvre ziviriye welatê xwe sûriyê dinav zarokê

2

xwede li gundê Şêx cidîd ,// gundê Gedo // jiyana xwe bûrandiye. Û maye piştgirê tevgera kurd heta roja dawî ji jiyana xwe , belê hejayî gotinê ye kû

gelek kongir û konfiransên tevger û partiyên kurdan di mala wî de hatine lidarxistin û gelek şevên newrozan û simînarên netewî li cem wî pêk hatine,

belê mala wî ji hemû kesên welat parêzre vekirî bû, û cihê rabûn û rûniştin û

çûn û hatina wan bû. Di ber dawiya jiyana xwe de kela dilê wî bi ser heskirina zimanê kurdî de radibe heme ew bi baweriyeke bê hempa berê xwe

dide kom kirin, û civandina çîrok û çivanokên kurdî û li gor karîna xwe wan

ji ber lehiya windabûn û jibîr kirinê di revîne û

Soz û peymanê didê kû ji vê rê venegere ta kû saxe li darê dinê û wiha di bêje

:

Ez pir geriyam li kurdistanê

Berî û berîstan

Çol û çolistan

Havîn û Zivistan

Li deşt û zozan

Buharên rengîn, ez bûm Perîşan

Serê min kete teq, reqên giran

Ji derd û xemê xortên xwendevan

Gelek reviyān çûne şaristan  
Piştā xwe dane gel û kurdistan  
Piştî temenê şêst û sê salan  
Ji nû ez ketim, nav nivîskaran  
Peyman be li min bi laleş û Êlim  
Ji vê rê ez qet venagrim....  
Belê dîsa dixwazim ji xwendevanan re bidim  
Zanîn vî kalemêrî bimêranî, û bîr û bawerî soza xwe  
Bi cî anî, ji ber ku wî karîbû sê pirtûkan ji çîrok û çîvanok, laqirdî, pêkenok  
û  
serpêhatiyên kurdan berhev bike, û çap bike û bike diyarî ji milletê xwe  
re,  
Ew pirtûk jî evin:  
-1laqirdiyê gundiyan  
-2xurcezîn  
-3Şeng û Peng.  
Ev jî pirtûka wiya çara ye dinavdestê mede bi navê „ Şevên Zengîn „ di  
xwazim ji xwendevanan re bêjim ku ev çîrokên gelêrî yên kû newaf Gedo  
ji  
mere ji kevneterê kurd bijartine bi hestê xwe yê tenik, ev çîrokên ku di  
ba  
weriya wîde, û ji me re jî diyarin ku hemû xwedî watene û kakilên wan  
hemû  
pend û şîretin, hemû ezmon û serpêhatînin hemû nêrîn û dîtinin, pêşyan  
ji  
paşyan re gotine û nifşekî sipartiyê nifşê bipeyxwere ta gihaye roja îro,  
bi  
3



wana tengasiyên xwe derbaskirine û demên .xwe yên vala dagirtine. belê Newafê Gedo di 17.10.2003an de çû ber dilovaniya Xwedê û li gundê Şêx Cidîdê hatebicî kirin , buhiştîbe û sed rehmet li gora wî bi bare.

Dildarê Mîdî

Qamişlo 15.11.2004

Hate ser Qûnê

Çîroka (hate ser qûnê) çîrokek kevne, di nav kurdan de gelek caran di civatan

de derbas dibe...Ev çîrok li ser Zimanê kal û pîran hatiye, ezê niha ji we re bêjim:

Yekî baş bazirgan hebû, bazirganiya xwe di navbera Bexdê û Istanbolê de dikir di heyamê berê de, bazirganî li ser piştta deve û qantiran dikirin, yê baş

bazirgan ji xwe re li sed siwarî pirsî , ku pêre karbibin, û wî biparêzin ji xerabiyê, û ji keleşan û eşqiya.

"Siwarek hat û ji yê bazirgan re got : Bira, ez tenê bi sed siwarî me, ma çima

tu wê sed siwarî bigre, û mûçê wan û xwarina wan bidî wan, hema ez ê bi te

re bêm, û ku ziyan giha bazirganiya te, wê çaxê ez li ber te me" Wilo, siwar û

yê bazirgan li hev kirin yê bazirgan sed bar bazirganiya xwe li deve û qantiran kir, û bi siwarê xwe re derket, berê xwe da bajarê Istanbolê.

Heger 10, heger 15 rojan bi rê de, ketin çiya û newalan... Di gelîkî kûr de, carekê nêrîn kû sed siwarî dora wan kirin xelek, û bazirganiya wî, tevî qantir

û deveyan ajotin û birin.

Yê bazirgan ji siwarê xwe re got : "kuro, ka te dest hilnanî, min go :ez ê ji

xwe re sed siwarî bînim, te go: ez besim ha va keleşan em talan kirin" yê bazirgan kir û nekir ewî siwarî dest hilnanî, û malê wî tev birin û çûn rabû yê

bazirgan bang li wan çetan kir û ji wan re got : "kuro, evî siwarê, min digot :

4

ez tenê bi sed siwarî me, û desthilanîn jê çênebû de (bazdin ser qûna wî) û wî

bi kujin...."

Ew keleş çûne siwarê wî, siwar jî li hespê xwe siwar bû, rahşite şûrê xwe û

ket nav wan, yê kû kuştin û yê ku reviyar, male yê bazirgan, tevji wan sitand . Wê gavê yê bazirgan jêre got : "bavo, tu wilo mêrî, çima te pêşî dest hilnanî" ...?

Siwar lê vegerand:

"Apo, ma ne hate ser qûnê"

\*\*\*\*\*

Şût û Rût

Rojekê Mîrê Botan û wezîrê xwe, cilên xwe guhertin, û li nav milletê xwe geriyan, li ber rê dîtin ku zilamekî cot dike, mîr silav lêkir û jê pirsî:

-Çima te virnî çand, Mamo? ..

Ewî zîlamî lê vegrand:

-Birazî, min hilî çand lê Xwedê virnî xist.

-Mamo, ma dûr çawa ne?

-Dûr nêzîk bûne.

-Selefa siwaran çawa ye?

-Kelo, kelo bûne.

5

-Rojekê yek kewekî baş ji te re bişîne, tu wê çawa bikî jê?

-Ez ê wî biperitînim, zelût bikim, tiştê jê bê xwarin ez ê bixum, û tiştê neyê

xwarin ez ê bavêjim.

Mîr û wezîr meşyan, wezîr jê pirsî:

"Mîrê min, te û yê cotkar çî ji hev re got"?

Mîr go : "bi xwedê ku tu ji niha û deh rojên dî wateya wan gotinan nas nekî,

ez ê serê te jêkim, ma çawa evê cotkar dizane û tu nizane"?

Vegeriyar mal, lê wezîr kir û nekir nizanîbû wan gotinan ji hev derxe neçare,

wezîr vegeriya cem yê cotkar û daxwaza wateya wan gotinan lêkir, lê yê cotkar go te wezîr : "Pêşî divê tu male xwe tevî bidî min, û emze bikî, dûv re

ez ê ji te re bêjim."

Rabû wezîr kaxezek nivîsî, û emze kir ku çî malê wî hebe ji yê cotkar re be, û

kaxez da dest yê cotkar.

Ji nû yê cotkar dest bi wateya wan gotinan kir û ji wezîr re got:

-1Mîr ji min pirsî, go : çima te virnî çand?

Ango : çima te zû jin ne anî û tu bi vî temenê mezin cotkariyê dike?

Min jî got : min hilî çand lê xwedê virnî xist ango:

Min zû jin anî, lê xwedê zû zarok nedan min.

-2Go : dûr çawa ne ? Ango:

çavê te dûr dibînin?

min lê vegerand : dûr nêzîk bûne.

Ango : ez dûr nabînim lê ez nêzîk dibînim.

-3Go : Selefa siwaran çawa ye?

Ango : diranên te çawa ne?

Min go : kelo-kelo bûne.

Ango : ketine.

-4Go : Rojekê ez kewekî qelew ji te re bişînim tuwî çi bikî jê?

Ji xwe kewê qelew tu bû.

Min got : ez ê wî biperitînim, zelût bikim û wî bi ser te de bişînim.

Ango :ez ê malê wî tevî jê bistînim û wî bi ser te de bişînim.

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

Têr û Birçî

6

Zilamek li ber xizna Mîr bû, Rojekê Mîr xizna xwe vekir, û zêrên xwe jimartin, dît ku zêrên wî kêmin, Mîr bang li peywanê xiznê kir, û pirsar zêrên

xwe jêkir, û piştî demekê jidan û standinê di navbera Mîr û yê peywanê de,

paşê diziya zêran li peywanê xiznê rast bû, ku wî zêr birine.

Mîr ferman da ku laşê yê peywanê tazî bikî, û wî deyne bal mêşdana hinguv.

Bi fermana Mîr re, laşê yê peywanê tazî – kirin û ew danîn ber mêşdana hinguv, Mîr û wezaretar xwe jî pêşberî wî rûniştin, û lê temaşe dikin.

Zilamek di ber yê peywan re hat dît ku mêşên hinguv li ser laşê wî dilîzin, çû

û mêşên ser wî firandin, lê yê peywanê xeyidî, go : "mêşan ji ser min

nefirîne". Mîr bang li yê rêwî kir û jê pirsî:

"Te çi kir, û wî çi ji te re go"?

Yê rêwî li Mîr vegerand : "Min mêş ji ser wî firandin, û ew xeyidî, go :wilo neke"

Mîr ferman da go : herin yê peywan bînin vir.

Çûn ew anîn, Mîr jê pirsî:

"Çima vî zîlamî mêş ji ser te difrandin û tu xeyidî" ?

Yê peywan go:

"Mîrê min, ev mêşên ku li ser laşê min bûn, têr xwaribûn, vêca ez ditirsiyam

ku ev mêşên têr herin, û hin mêşin birçî bîn, ewê laşê min ji hev de bînin"

Rabû Mîr ferman da û got : "de herin vî peywanî bibin, laşê wî bişon, ez ê wî

deynim ber xiznê, evî zîlamî têr xwariye nema zêran dibe, lê ku yekî dî hat ew ê birçî bê, û ew ê xiznê berbat bikî"

Bi vî rengî yê peywan azad bû, û ma peywanê xizna Mîr.

7

Şivan bû keye

Mîrê Botan û wezîrê xwe cilên xwe guhertin û geriyan, gihane gundekî çûne

oda keye.

Keye Mîr nas nake, Mîr dî ku keyê gund gelekî paye ye, rabû ji wezîrê xwe re got : "bêje keye bera ji niha û mehek din bê Cezîra Botan, xwe amade bike

ji sê pirsan re, ez ê sê pirsan jê bikim, heger bersiva min neda ez ê serê wî

jêkim"

Mîr derket, wezîr jî wilo ji keye re got, û giha Mîr, çûne mal. keye ma di

metalan de, rabû şivanê wî jê pirsî, go : çima tu wilo bê madî?

Keye çîroka xwe û Mîrê Botan ji şivanê pezê xwe re got.

Şivan jê re got : "ev û ne tiştek bavo, hema ez ê li şuna te herim cem Mîr, lê

ku Mîr serê min jêkir hew tuwê zarokên min xwedî bikî"

Wilo ji hev re gotin, û piştî ku meha wan zîvirî, rabû şivanê keye çû Cezîra Botan, derbasî dîwana Mîr bû, û jê re got : "Mîrê min, ez keye me, û ez hatime cem te"

Mîr go : "Başe, ez ê sê pirsan ji te bikim û tuwê bersiva min bidî"

Şivan lê vegerand : " Başe"

Pirsa yekê : deryaya sipî, çend dilop têde hene?

Mîrê min, çemê ku diçin ser wê deryayê, ji ser qut bike û ez ê ji te re bêjim ka çend dilop yên deryayê tenê ne.

-Pirsa didwan : ez Mîrê Botame ma ez hêja me çend zêran?

-Mîrê min, tu hêja ye 6 zêran.

-Ka çawa ez hêja me 6 zêran?

-Pêxember Yûsif firotin bi 7 zêran, ma ew bi zêrekî ji te ne çêtire.

-Belê .... Raste ....pirsa sisyan : heger tu zanibî ka ez di zikê xwe de çi dibêjim?

-Mîrê min, tu dibêje : çawa ev zîlamê pîsik dikare bersiva van pirsên min bide?

-Raste, kurê min bi Xwedê tu hejayî ku bibe keye . - Na, Mîrê min bi rastî ez ne keye me, ez şivanê pezê keye me.

Rabû Mîr kaxezek jêre nivîsî, û dayê , go : "De here tu bû keyê gund û keyê niha bû şivanê pezê te. "

8

Kerê boz

Yekî belengaz, barek mewîjên wî hebû, Rojekê rahişte barê mewîjê xwe li

kerê xwe yê boz kir û çû berê xwe da cem Mîrê Botan Di wê demê de Mîrê

Botan jî cilên xwe guhertibûn, û li dervî Cezîrê li hespê xwe siwar bû û digeriya. Yê belengaz û Mîr li hev rast hatin, Mîr jê pirsî : "tuwê bi kû de here

" ?

Yê belengaz lê vegerand : "ez ê herim vî barê mewîjan bibim ji Mîrê Botan re"

-Çima tuwê van mewîjan bidî Mîr?

-Ez belengazim, wê Mîr jî tişteki bidî min, ez ê bibim ji zarokên xwe re.

-Heger Mîr neda te?

-Berê wê bidî min.

-Bavo, ma ku neda tuwê çi bikî?

-hema ku neda, ez ê kerê xwe berdim ser jina wî.

Mîr bi hespê xwe dûrî rê ket, û zû xwe gihande mal.

Piştî demekê yê belengaz bi kerê xwe ve giha ber deriyê Mîr , kerê xwe girêda û derbas bû hundir cem Mîr, Mîr jî taca xwe daye serê xwe, dema çav

li yê belengaz ket go : "Xêre"

Yê belengaz lê vegerand : "Mîrê min va min barek mewîj ji te re aniye"

Mîr go : "Çima te anî, tu belegazî, ma ez ê çi bikim ji mewîjan"?

Yê belengaz go : "Bi Xwedê, min go belkî tu jî barek genim bidî min ku ez bibim ji zarokên xwe re"

Mîr go : "û belkî ez nedim te"

Yê belengaz keniya û got : "Berê tuwê bidî min, ma tu min destvala venagerîn"

Mîr go : "ma hema ku min neda tuwê çi bikî"?

9

Yê belengaz ji gotinên Mîr nas kir ku ew bû zilamê li hespê li dervî Cezîrê digeriya rabû ji Mîr re go:

"Mîrê min, ku tu nedî min, wa kerê boz li devê derî girêdayî ye ha"

Mîr ji nû keniya, barek genim, û hin zêr dane yê belengaz, go:

"de here, ji zarokên xwe re xerç bike. "

Pakêt

Rehmetiyê melle Mustefa Barzanî, xelk diçûn civata wî, tim pakêteke cigaran

vekirî di destên wî de bû, pakêt davête vî destî, û davête destê dî.

Rojekê civatê ji Barzanî pirsî:

"Seyda, tu cigaran venaxwe, û tim pakêt di destên te de ye"?

Barzanî ji wan re got:

"Ez ê çîroka vê pakêtê ji we re bêjim : du leşkerên turk jineke kurd ya avis girtin, her du leşkeran ji hev re gotin : ev jinik avise yekî ji wan go : " berê jinikê keçike " û yê dî go : " na, berê wê kurike "

Rabûn li ser pakêtekê lîstin, û singo li zikê wê jinikê xistin qelaştin, da nas bikin çi di zikê wê de ye".

10

Bazirganê pîvazan

Hezar zêrên zilamekî hebûn, ji vî welatî çû Istanbulê da ji xwe re bi wan zêran bazirganiyê bikî.

Li Istanbulê çû hotêlê, çend rojan li hotêlê ma derdiket ser balkonê, dendik

dixwarin û qaşilên dendikan davêtin ser yekî solbend ku di binya wî re sol didirûtin. Çend rojan bi vî rengî, her qaşil dihatin ser yê solbend . Yê solbend



qenc yê bazirgan naskir, rabû çû mala xwe guhert, bedlek li bejna xwe kir  
û

hate hotêlê cem yê bazirgan, li cem wî rûnişt û lê pirsî, go: "Tu  
xerîbî, tu ji ku yî, û te xêre li vê derê?" Yê bazirgan lê vegerand:  
"Ez ji cîkî dûrim, û ez hatime bazirganiyê bikim"

-Başê, ma perê te pirin?

-Bi xwedê 1000 zêrên min hene.

-Başê, bira, tu hatiye bajarê Istanbulê û tu deverê nas nakî, ez bi xwe  
ji

virim, hema ez ê jî 1000 zerî bidim, û ez û te em ê bazirganiyê bi hev re  
bikin. Li hev kirin, û her yekî ji wan 1000 zêr danî. Sibehê  
daketin sûkê, yê solbend go:

"Bira, niha pîvaz erzanin, ez li vir bi bazaran dizanim, em ê bi zêrên xwe  
pîvazan bikin, û piştî demekê ku buha bûn, em ê wan bifiroşin."

Rabû bi 2000 zêrî pîvaz kirin, û pîvazên xwe xistin hundirê xanan.

Yê bazirgan û yê solbend mehekê pîvazên xwe di xanan de hiştin, serê  
zêrekî wan – li gor buhabûna pîvazan – bû zêr û nîvek, yê bazirgan go:

"De ka em pîvazên xwe bifroşin"

Yê solbend go: "Na, bira, niha zûye wê hîn pîvazên me buhatir bibin"

Piştî demekê, zêrekî wan bû du zêr, lê pîvazên xwe ne firotin, dîsa yê  
bazirgan digot: "Em ê pîvazên xwe bifiroşin", û her yê solbend digot:

"Na,

hê zûye ev karê min e û ez dizanim."

Çendakî man, roj bi roj, pîvaz erzan bûn, û yê solbend ma li ser awira  
xwe.

Roj bi roj pîvaz xerabûn, bêhn ji xanan difûriya, û bêhn kete nav bajêr.

Hukûmetê biryar da ku wan pîvazan bavêjin, pîvaz bi kemyonan kişandin

û

evêtin çolê , dervî bajêr.

Yê bazirgan rabû giriya û gazin ji yê solbend kirin, go:

"Te mala min xerakir , malê min tev hate avêtin"

Yê solbend go : "De were , were " bi destê yê bazirgan girt , û ew bire mal,

jêre got : "Ma ne tu bû , te qaşilên dendikên xwe davêtin ser min ? tu ji bo

11

1000zêrî digirî ?" , û ode vekirin , go : "Binêre, ev zêrin , ev zîvin , ev mecîdî ne , ev tev yên bapîrê minin , û min hê dest nedaye wan"

Çû oda dî vekir , go : "Ev jî tev perên bavê minin , min dest nedaye wan ."

Odake dî jî vekir , go : "Ev jî zêrên min û perên minin, de rahêje 1000 zêrî , ji

xwe re bibe û tu li vî welatî nesekine ha."

\*\*\*\*\*

Alî bapîrê xwe ke

Di heyamê berê de , leşkerên turk li ser pişta hespan bi siwarî digeriyan. Carekê leşker hatin gundekî , li wan bû şev , û zivistane , li wî gundî şevder man leşkeran serê malê hespekî xwe dane wan , da wan êm bikin , gihane mala yekî seyid.

Seyid ji wan re got : "cî li cem min tune ye , û sewalên min hene", lê leşkeran

zor lê kirin , û çendî gundiyan ji leşker re gotin : "Ev seyide û wê bi we vede"

lê leşker bi seyid de xeyidîn , bera sewalê wî ji hundir dan, û hespê xwe xistin hundir û çûn.

Rabû yê seyid ji zarokên xwe re got : "Lawo , ez ditirsim ku bapîrê me bi wan  
venede , divê em alî wî bikin , de rabin em alî bapîrê xwe kin , û em bi xwe  
tişteki bi wan bikin û vî hespî bikujin."  
Seyid û zarokên xwe rahiştin daran , û wê şevê bi daran bi hesp ketin , hesp  
di hundir de kuştin bê ku xwînê jê bînin , û li mal razan.  
Sibehê seyid xeber da keye , go:  
"Va hespê leşker di hundir de miriye."  
Keye ji çawîş re got : "Me ji te re got : ev seyide , û wê bi te vede , lê te bi ya  
me nekir , ah waye hespê we di axur de miriye."  
Çawîş û keye çûn mala seyid , û çawîş xwe avête destê Seyid , go : "Me tade  
li te kir , û ez hêvî dikim tu me bibûrînî " û çûn.

\*\*\*\*\*

Ez fêr bûm

Demsal buhare , zilamek ji jor dakete deştê nav koçerên pez , dema bêriyê ye

,bêrîvanî pez bêrî dikin , û didoşin.

Ewî zîlamî xwe qulûz kir , û xwe li nav pez qeliband , pez cefilî , û li bêrîvanan qelibîn , beroş û salilên şîr li ser qadê û bi ser wan de rijîyan.

Bêrîvan li wî zîlamî kom bûn , û pêketin lêxistin , ewî go : "Bavo , ma hûn çima li min dixin" ?

Bêrîvanan lê vegerandin:

"Lawo , ma xelk wilo dikin"?

-Ma çilo?

-Tu bihata , û te bigota : bereket be – bereket be.....

-Başe , ez fêr bûm...

12

Bêrîvanan ew berdan , çû giha gundekî , giha ser mezel dî ku xelk tirbekê dikolin, go : "Bereket be, bereket be"

Dîsa xelk pê de xeyidîn , ewî go : "Bavo , ma ez çi bêjim" ?

Gotin : "Te bigota , bera hûn sax bin , rehme lê be."

Go : "Başe , ez fêr bûm"

Ew zilam ji wir çû gundekî din , dît ku Şahiye , û xelk dîlanê dîkin , gurmîna def û zirnê ye , go:

"Bere hûn sax bin , rehma Xwedê lê be"

Mirovên zavê pêde xeyidîn, ewî go:

"Ma ez çi bêjim, hema ez bi kû de diçim , xelk bi min de dixeyidin."

Ewan lê vegerandin:"Te bigota: ser xêrê be, û pîroz be"

Go: "Başe, ez fêr bûm, lê ez nema tişteki ji kesî re dibêjim"

\*\*\*\*\*

Hemê û kenê 'n

Mûso hebû , gavanê gundekî mezin bû , axakî mezin li wî gundî bû , eşîra axê mezin bû , civata wî geriya bû.

Axê ji mellê re got : "Seyda şevê dî min xewnek dîtiye"

Melle go : "xêr be , bêje"

Axe go : "min dît , du mêşên reş ji tebakê min derdiketin , difiryan û li ser sergokî datanîn"

Melle go : "xêr be , başe , wê du kur ji te re çêbibin"

Gavanê gund Mûso keniya , go : "Seyda , bi xwedî min fedî fikir ku ez bêjim

de hema ezê jî ya xwe bêjim"

Melle go : "xêr be ....bêje"

Mûso go : "Min dî du mozên sor ji tebekê min derdiketin , û bi jor diketin ,

çûn , bilind bûn , hingî bilin firiyan , ji reşik û tarî ketin."

Melle go : "Mûso , xewna te xêr be , gelekî başe"

Melle bang axe kir , go : "axa , ezê xewna te û Mûso bêjim , lê hema xwezî tu

li şûna Mûso gavan ba , û Mûso li şûna te axa ba , û bera xewna Mûso ya te

ba , û ya te ya Mûso ba"

Wê du kur ji te re çêbibin , û ewê weke sergo pîs bin û wê du kur ji Mûso re

çêbibin , lê wê nav û dengê wan bi cîhanê keve , ewê her bi jor de herin , û

wê navê wan bimîne.

Jina axê barê xwe danî û du kur jêre çêbûn , û ya Mûso

jî du kur jêre çêbûn.

Weke ku melle got : herdu kurê axê pîs derketin.

Du kurên Mûso , yek bi navê Hemê bû , û yê dî bi navê kenê' n bû , temenê wan bû şeş – heft sal , bi bavê xwe re diçûn ber garanê , û li keran siwan dibûn , darên wan di destê wan de bû , û li ser piştê keran bi hev re dilîstin

,

weke şerê şûran dikirin , û çendî bavê wan ji

wan re digot:

13

"Lawo , we hevdû westand we hevdû kuşt , hûn hevdû têşînin , hûn di keran

werdibin."

Lê her karê herdu kurên Mûso ev bû , û bi vî rengî Hemê û kenê' n bûne du

siwarên jîr û xurt , heta ku bûne xort.

Rojekê Hemê ji kenê' n re got:

"kuro , ma em li ser pişta van kerane , û bavê me jî gavane , ma hema emê

jiyana xwe wilo derbaskin ? ka em herin cem axê" ..

Kenê 'n go : "kuro , emê herin cem axê çî" ?

Hemê go : "were , bide dû min , emê herin du hespên baş ji axê bixwazin

,

bera du hespan tev li sîlah bide me"

Hemê û Kenê' n çûne cem axê , gotin:

"Axa , em hatine cem te , û em dixwazin tu du hespên baş tev li sîlahê wan

bidî me , axa ma em mane li pişta van keran."

Axê bang li xulamê xwe kir , û bi dizî di guhê wî de got : "Here du bergîlan ji

wan re derxe."

Xulam du bergîl ji wan re derxistin , lê çawa Hemê û kenê 'n derketin û çav li

bergîlan kirin , vegeriyan cem axê , û giliyê xwe kirin , gotin:

"Em hatin cem te , ku tu du hespên xweşik tev li şûran bidî me , lê va xulamê

te bergîl ji me re anîne , em dixwazin xwe bi hespan paye bikim , ma em bergîlin ku em li bergîlan siwar bin."

Ji nû axê bang li xulamê xwe kir , go:

"de here ji wan re du hespan tev li şûr û mertalan bîne" Xulam du hesp tev li

şûr û mertalan ji wan re anîn.

Hemê û kenê 'n rabûn li hespê xwe siwar bûn , rahiştin şûr û mertalên xwe , û

hesp ajotin , dan cirîda.

Xelk hatin temaşa wan û nav û dengê wan li her çar aliyê welêt û li cîhanê belav bû.

14

Baqê nîska

Zilamekî nîskên xwe cinîbûn , çû nav nîskên xwe , di ber gidîşa nîskan de dît

ku zilamek di ber jina wî de ye.

Çawa çav lê ketin , yarê jinikê rahişte baqekî nîskan û bazda.

Yarê jinikê gîha ber gundekî , xelk derketin û lê kom bûn , jê pirsîn:

"Kuro , çima tu bazdide ? û ewê li dû te çi ji te dixwaze"?

Ewê li wan vegerand:

"Bi xwedê min rahiştiye vî baqê nîskan , û ew bi dû min ketiye."

Xwediye nîskan gîha wir , xelkê jê pirsîn : "Kuro , ma ji bo baqek nîsk tu bi dû vî zilamî ketiye ? , ma te dunya nedîtiye" ?

Xwediye nîskan li wan vegerand:

"Bavo , yê ku zani be , zane , û yê ku nizanibe , ewê bêje baqê nîska ye. "

Ribka wî

Çîroka ( Min di ribka wî ve) çi ye ? ezê ji we re bêjim. Gundekî mezin hebû

,

dewarên wî pir bûn , û gavan hebû diçû ber dewaran.

Golikê gundiyan hinekî mezin bûn , bi çêrê ketin , xelkên gund ji hev re gotin

" :Emê ji xwe re gavanekî ji bo golikan bigrin."

Yekî belengaz anîn , û jêre gotin : "Ma tu naçe ber golikên me"?

Ewî go : "Berê , ezê herim , ma hûnê çi bidin min"?

Heyamê berê kirîn û firotina ceh û genim bi elbê bû , du elb jêre digotin olçekkek , vêca ribikek nîv elb bû.

15

Gundiyan ji yê belengaz re gotin : "Emê serê golikekî mehê ribikekê bidin te"

.

Yê belengaz go : "Başê sibehê bere gundî golikên xwe derxin û bînin çolê serê qelêç , û ezê lê ber wan bim ". Sibehê , gundiyan , pîr û kalan , zarok û mezinan golikên xwe derxistin , birin serê qelêç û gavan ma li ber wan

.

Golikin û çol nedîtine . golik bazdidin û gavan nagîhê wan .Golikekî bazda û çû , gavan negihayê , go:

"de here , min di ribka te ve."

Sê çarekî dî jî bazdan , dîsa gavan negîha wan , go:

"De herin , min di ribka we ve jî."

Bi vî rengî man şeş – heft golik li çolê , ewan jî teriya xwe bilind kirin û berê

xwe dane mal.

Yê gavan jî dawa xwe li xwe gerand , berê xwe da gund , û bi golikan re bazda , go:

"Ji min, û ji we , ka kî berê digîhê gund"

Yê gavan tev li golikan bi bazdan gihane gund , û yek golik jî li çolê nema

.

16

Wateya êqil

Weke ku min ji çîrokbêjan bihîstiye , ezê wateya êqil ji were bêjim:



Keça axayekî hebû gelekî spehî bû , dibêjin kî diçû ku destê wê keçikê bixaze

,bavê wê ew nedida , û digot : "Ez keça xwe nadim ku ne ew kesê ku wateya êqil ji min re bîne."

Dibêjin Heso xortekî spehî û maldar bû , çû keça axê bixwaze , ji bavê wê re

got : "Tuwê keça xwe bidê min, û ji niha û mehek din ku min wateya êqil ne

anî serê min jêke."

Axê keçik da Heso û jêre got : "Heso keça min giha te, lê ji niha û mehek din

ku te wateya êqil ne anî , ezê serê te jêkim , û malê te tev dî bibim."

Wilo , Heso destgirtya xwe guhest û şahiya xwe jî çêkir , heftakî ma li cem jina xwe , û li hespê xwe siwar bû , çû li wateya êqil bigere.

Heso geriya , û digîha kîjam gundî , ji xortên zana û geryayî, û ji kalên zemana dipirsî : "Wateya êqil çiyê"?

Di bersiva wî de digotin : "Bavo , em nizanin."

Bi vî karî , çîrokbêj dibêje ,18 salan Heso geriyaye û nas nekiriye .Piştî 18 salan Heso berê xwe da mal , ji xwe re got:

"Bi xwedê ezê vegerim , ez negîham tişteki de ka ez herim, binerim, ka bê

axe saxe yan miriye ? kî miriye ? û kî maye" ?

Li vegeerê Heso gîha qesrekê , ji xwe re got : "Bi xwedê îşev ez westiyam , ezê

herin vê qesrê , û ezê xwe vehesînim."

Hespê xwe li hewşa qesrê girêda û derbasî qesrê bû . Heso dît kalekî rî sipî

li qesrê ye , rengê wî yê 70 salî ye , li qesrê rûniştiye ...êvare û demê şîvêye  
Heso silav li kalê por sipî kir û rûnişt.

Piştî şîvê , kalo lê pirsî:

"ha birazî , tu ji kû tê ? tuwê bi kû de here ? te xêre." ?

Heso çîroka xwe ji kalo re got , û jêre got:

"Ez li wateya êqil digirim."

Kalo go : "Birazî , va îşev tu li virî , de ka heta sibê , ezê jî raman bibim."

Li hev pirsîn û xwe bi hev naskirin dan , navê kalo miho bû.

Miho bang li jina xwe kir , go:

"Ka şebeşekî ji me re bîne."

Jinikê çû şebeş anî , Miho go : "Vî şebeşî bibe , û yekî dî werîne."

Jinikî go : "Bavo , şebeşên te tune ne ji vî pêve , de bişkîne û hew."

Şebeşê xwe şikandin , xwarin û razan.

Sibehê rabûn taştê xwarin , Heso go : "Amo , ka te nas nekir."?

Miho go : "Birazî , bi Xwedê ez çiqasî mijûl bûm , ez negîham wateya êqil,  
lê

ezê tişteki ji te re bêjim , ev gundê bi dû me de , li devê riya te ye , birayê  
min

17

yê ji min mezintir (E 'lo ) li wire , tuwê here cem wî , heye ew wateya êqil  
dizanibe."

Heso xatir xwest , bi rê ket û çû , gîha gundê pêşî , zilamek rih û pore wî  
reş

li gund bû , silav lê kir, ji xwe re got : "Bavo, Miho go : birayê min ji min  
mezintire, va pirça vî hê reşe , û ya Miho hemû sipî bû."

Heso rûnişt , E'lo jê pirsî : "Ha mêvanê delal, te xêre ? " Heso çîroka xwe  
jêre

bi dar vekir.

E'lo go : "De îşev li vir be , tu gelekî geriyaye , emê şîv bixun , û heta sibê ka

bê çî dibe."

Şîv xwarin , E'lo bang li pîreka xwe kir go : "ji me re şebeşekî bîne."

Jinikê şebeş anî ,E'lo go : "vî şebeşî bibe û yekî dî werîne."

Dîsa jinikê şebeş bir û veşeriya , lê mêrê wê dîsa ew şand , û bi vî rengî çar-

pênç caran jinikê ew şebeş dibir û vedigerand , paşê jinikê go : "Bavo , de şebeşê xwe bixun."

Şebeşê xwe xwarin , wê şevê razan , sibehê rabûn taştê xwarin , Heso pîrsa

wateya êqil kir , E'lo go:

"Bi xwedê min nas nekir , lê ev gundê di piştî gundê me re , birayê min Restem li wire , ji min mezintire , de here cem wî heye ew zanibe."

Heso çû , gîha gundê din , dît ku yekî simbêl reş , û li hev hatî li wire , silav kir , û ji xwe re got:

"Bavo , ev çawa çêbû , ev ji herduwên din ciwantire , ji xwe ji min re digotin

,ev birayê mezine. " !!

Şîv xwarin , Restem lê pîrsî , Heso çîroka xwe jêre got Restem go :

"Wateya

êqil ? ,ev pîr hesane bavo ,de îşev li vir be."

Restem bang li jina xwe kir , jinikê avis bû , daket cem wan , Restem ji jina xwe re got : "Şebeşekî ji me re werîne."

Jinikê bi zikê xwe yê giran çû , şebeş anî lê mêrê wê , go : "Vî şebeşî bibe , û

yekî dî werîne."

Jina Restem bê ku dengê xwe bike , şebeş dibir û vedigerand , her mêrê wê

ew vedigerand , û her çiqas mêvanê wan Heso , li ber Restem diba ku jina xwe ne westîne , lê mêrik jina xwe dişand , bi vî rengî çil caran jinik çû û hat

.Heso sûnd xwar go : "Bi xwedê , ku vê carê ew here ez li vir namînim."

Restem şebeş şikand , şebeşê xwe xwarin , Heso go:

"Bavo , çîroka te û birayên te ji çîroka min bêtir di dilê min de bû kul."

Restem go : "Çawa."?

Heso go : "Birayê te yê biçûk , rî û parê wî tev sipî bûn, û nîşanê ciwaniyê tê

de nexuyabûn , birayê te yê navê jî bi gelekî ji wî xurttir bû , ji xwe tu yê mezinî , tu ji herduwan jî ciwantire , ev çîroka we çawa ye. " ?

Restem lê veğerand , go:

"Birazî , jina wan bi ya wan nake , û her yek ji wan , li gor rewşa jina xwe kal

bûye , lê yê min , jina min bi ya min dike , ji ber wilo ez hê ciwanim."

18

Restem û mêvanê xwe wê şevê razan , û sibehê hişyar bûn , Restem ji Heso

re got : "Birazî, wateya êqil sebre , de oxir be ji te re."

Heso xatir xwest , da rê gîha mal , nîvê şevê ye , çira vexist , dît ku jina wî razayî ye , û xortekî simbêl reş di ber wê de razayî ye , doşekên herduwan di

ber hev de ne.

Heso li wan nerî , kûr û dûr raman bû , carna ji xwe re digot:

"Ezê şûrê xwe li serê wî bixim , û ezê wî bikujim".lê carna jî digot : "Bavo

,

divê ez bi aqilbim , ev 18 sal , ez li wateya êqil digirim , ez ji bo êqil biçolan ketim û wateya êqil sebre , de ka ez sebrê bikişînim ". Sibehê ji xew hişyar bûn , jina Heso çav li mêrê xwe ket , go : "Xuyaye te wateya êqil aniye , ji ber ku te ne anîbe , şevê dî te kurê xwe kuştibû.. Evê ku şevê dî di ber min de raza bû kure te ye."

Singê golik

Zilamek hebû sê – çar gellacên wî hebûn , karê wan gellacî di nav xelkê de dikirin . Her êvar , ew gellac dihatin cem mezinê xwe , û çîroka gellaciya xwe jêre digotin.

Carekê hemiyar gellaciya xwe gotin , lê yekî pîsik û bi çavekî di nav wan de bû , gelaciya xwe negot.

Mezinê gellacan bang li yê pîsik kir û jêre got : "Kuro , ka çima tu gellaciye xwe nabêje." ?

Ewê pîsik go : "Bi xwedê , min tiştê nekiriye , hew min singê golik rakiriye."

19

Gellac hemû bi yê pîsik keniyar , û gotin : "Te singê golik rakir , ma dunya xerabû." ?

Yê pîsik , go : "Bavo , vêca ezê çîroka – singê golik – ji we re bêjim : Gelî hevalan min singê golik rakir , golik çû ket bin çêlekê , û çêlek mêt , jina xwedî çêlekê hat û darek li serê golik xist , golik di cî de kuşt .Mêrê jinikê hat dî ku jina wî golik kuştîye rahişt darê ku jinikê pê golik kuştibû , ew dar li serê jina xwe xist , wî jî jina xwe kuşt.

Birayên jinikê û birayên mêrik hatin, ketin nav hev de , û 7 mirov ji hev kuştin."

Ji wê rojê de , yekî ku gellacîke mezin kiribe , jêre dibêjin : "Singê golik rakiriye."

\*\*\*\*\*

Gurî bûye axe

Axayek hebû , bavê keçek sipehî bû , keça axê û xortek dilketin hev , lê ewî

xortî keçik dixwest û axê keça xwe nedida , ewî xortî gelek kes dişandin cem

axê , û daxwaza kaça wî jê dikirin , lê axê digot : "Ez keça xwe nadim."

Xort û keçikê hevdu revandin , û ji tirsê bavê keçikê re çûn welatê dûr.

Xort û keçik man li welatê dûr , û piştî 15-20 salan , Zilamek ji welatê mal bava keçikê diçe wî welatê dûr , ew zilam keçikê li wir dibîne.

Keçik wî zilamî dibe mal , şîva wî çêdike , û pirsê mala bavê xwe û xelkên

,

û pirsê welêt jê dike.

Ewî zilamî di berşîva wê de got : "Mala bavê te û xelk qencin , û Gurî yê birayê te bûye axe."

Keçik giriya û kire hewar , gundî lê vehewiyan û jê pirsîn : "Te xêre , çi bûye."

Lê keçik her digiriya .Gundiyan ji yê mêvan pirsîn:

"Te çi jêre gotiye ? ev çi bûye."?

Ewî zilamî go : "Bavo , min tiştê jêre negotiye , min go : Guri yê birayê te bûye axe."

Gundiyan ji keçikê pirsîn : "Bavo , ma birayê te bûye axe , çima tu digirî"

Keçikê li wan vegerand : "Ku mala bavê min ne qeliyana Gurî yê birayê min

nedibû axe."

\*\*\*\*\*

Qala namûsa camêra meke

20

Dibêjin nebî Suleyman mirov , cin û teyr tev di bin destên wî de bûn . Jina wî

Belqîs gelekî spehî bû , û kêfa wî gelekî ji jina wî re dihat.

Rojekê nebî Suleyman û jina xwe Belqîs rûniştîbûn , Belqîs ji nebî Suleyman

re got : "Divê tu ji min re doşekê ji periyên teyran çêbikî."

Nebî Suleyman fermanek derxist , û ji hudhud re got:

"Divê tu teyran hemuyan bicivîne , û xeberê bide wan ku tev bêne cem min."

Hudhud tilûr civandin û xeber da wan , ji nebî Suleyman re got : "Wê di rojek

nêzîk de , tilûr hemû li cem te kom bibin."

Di wê rojê de (roja nêzîk) , tilûr tev li cem nebî Suleyman vehewiyan , û jêre

gotin : "Kerem ke , tu çî ji me dixwaze , va em li ber te ne."

Nebî Suleyman go : "Divê hûn hemû xwe biperitînin , periyên xwe li vir bihêlin û herin."

Beraçemkê xwe peritand , go : "Karê min heye , zarokên min hûrin , ezê herim bi wan ve " , bi vî rengî beraçemkê di cî de xwe zelût kir û çû.

Ji wê demê de ew kesê ku bêşek were ser wî , û zû bide yan jî tiştekî zû bike

yan bide bê şêwir , jêre dibêjin:

"Weke beraçemkê xwe zû peritand."

Teyran li hev nerîn , dîtin ku kund ne di nav civînê de ye , ji nebî Suleyman

re gotin : "Ka kund , nehatiye civînê". Nebî Suleyman ji hudhud pirsî:

"Ma te ji kund re ne go : Were civînê."?

Hudhud go : "Belê , min jêre gotiye , lê ew nehatiye."

Nebî Suleyman di dilê xwe de gelekî geherî , xeyidî , û ji baz re got : "De here

, zû kund bîne , ma çawa evî gotina min şikandiye."?

Baz ji Hudhud re go : "Ma kund li kû ye."

Hudhud go : "Bavo , li ser kaviên xerabe ye , hama her tuwê wî bibîne."

Baz çû ser kaviên xerabe kund dît , ew da ber xwe , û anî cem nebî Suleyman.

Nebî Suleyman bi xeyd ji kund re got : "Tu ji xwe re li çavên wî yê zer binere evqas teyr hatine , û tu nehatibû."

Kund go : "Çavên min zerin hemû nezerin."

-Tu li serê wî yê mezin.

-Serê min mezine lê hemû aqile.

-Tu li qûna wî.

-Qala namûsa camêra meke.

-Ne tu dibêje : Serê min mezine lê hemû aqile ? de ezê niha çend pirsan ji te bikim.

-Bêje.

-Mirî pirin , yan zindî pirin?

-Mirî pirin.

-Tu ji kû dizane?

-Mirî ji xwe mirîne , û yê razayî jî ji miriyan tên ji martin , wilo mirî ji zindiyan pirtir dibin.

21

-Pîrek pirin yan zilam pirin?

-Pîrek pirin.



-Tu ji kû dizane?

-Pîrek pîrekin , û yên wek te jî ku bi ya pîrekan dikin , ji pîrekan tên jimartin , wilo pîrek ji zilaman pirtir.

-Çawa ez bi ya pîrekan dikim?

-Belê , te evqas teyr civandin ku xwe biperitînin , û ji serma zivistanê bimrin , ji bo doşekê ji jina te re , ma ev duriste ? ha va tu bi ya pîrekan dike.

Nebî Suleyman ferman da ku tilûr tev vegerin cihê xwe , wilo û bi xêra kund , nebî Suleyman tev efû kirin.

Hekîmê luqman

Çawa Hekîmê luqman bû textor?

Ezê ji xwendevanên kurd re bêjim , çawa Hekîmê Luqman bû textor, bawer bike , yan jî bawer neke , lê ezê bêjim.

Di civatên kurdî de , em di odeyan de , di şevbuhêrkan de rûdiniştin , di wan şevên zivistanî yên dirêj de ku serma dibariya , ku agirê bişkul û tepikan yan jî yê êzingan dikirin , di sêlikan de yan di tenekan de , ji berî 50salî de , û ku kalemêrên çîrokbêj ji me re çîrok digotin , ev çîroka Hekîmê Luqman hatiye gotin:

Heyamê berê padîşahek hebû , hingî wekhevî li cem wî hebû , werîsek danî bû devê derî , û ku xelk dihatin ber deriyê wî û daxwaza hevdîtina

22  
padîşah dikirin , ku peywanan destûr nedabana , xelkê ew werîs dikişandin . Bi kişandina werîs re zengil li dîwana padîşah lêdida , wê hingê padîşah ferman dida zilamên xwe ku wî kesê ku li zengil xistiye bînin dîwanê.

Ewî padîşahê dilovan werîsek li serê bajêr jî danî bû, û ku yekî ew werîs jî bikişanda , dîsa zengil li dîwana padîşah lêdida.

Carekê dengê li zengil ket û nema sekinî , bû xurrîna zengil , padîşah

ferman da û ji peywanan re go : "Herin , binerin ev çiyê."

Peywan çûn serê bajêr , dîtin ku zîhakî xwe li werîs gerandiye û werîs dihejîne.

Dema peywanan ev xeber dan padîşah , padîşah û wezaretê xwe rabûn, û çûn bi alî serê bajêr de , lê zengil her lêdida , gihane wir , padîşah ji wezîrê xwe re got : "Em çî bikin ji vî marî ? Helbet ev mar tiştêkî dixwaze , ku wilo vî werîsî dihejîne."

Padîşah û wezîr bi hev şewirîn , li dawiyê biryar dan ku hemû xelkên bajêr tev li tiştên di dest wan de bîn cotkar , karker , xerrat , pale , hoste ,  
xwendevan , û hesinkir , tev li halet gîsin bîn , tevşo , das , birrek , xame , û çakûç ... , û hemû , yeko - yeko di ber wî marî re derbas bin.

Xelkên bajêr tev hatin û yeko – yeko di ber mar re derbas bûn .Yê xerrat jî di nav wan de , birreka wî li ser milê wî ye , çawa mar çav li wî ket , ji ser werîs daket , û çû cem wî ji nav hemuyan , mar bi dawa yê xerrat girt .

Padîşah ji xerrat re got : "Kurê min , tuwê bi vî marî re here , heger tu vegeriya , ezê danake mezin bidim te , û heger tu venegeriya jî heta ku ez sax bim , ezê zarokên te xwedî bikim."

Mar meşiya û yê xerrat da dû wî , Mar meşiya .... maşiya , çû kete çiyê , kete şikeftê de . Yê xerrat jî bi dû mar kete şikeftê de .Yê xerrat dît ku zîhakî maran di şikeftê de beranekî kovî daqurtandiye , stirehkên beranê koviyan mezin bûn di devê mar de maye asê , û nema ne diçe û ne jî tê . Yê xerrat rahişt birreka xwe û stirehên beranê kovî birrîn , û mar beranê kovî tev daqurtand , û piştî ku mar ew beran daqurtand , yê xerrat da dû xwe û ew bir dawiya şikeftê , weke du kulmên ard di wir de bûn .

Mar serê xwe ji xerrat re hejand ku rahêje wî ardî , rabû yê xerrat du

kulmên xwe di ard de dakirin , xistin nav dismala xwe û derket berê xwe da bajêr , gîha wir , li zengil xist û derbas bû cem padîşah.

Padîşah dev li ken ji xerrat pirsî : "Çi bi te re çê bû."

Yê xerrat çîroka xwe ji padîşah re got , û her du kulên ard danîn ber wî.

Padîşah jî danake baş da yê xerrat , û bangkire wezaretê xwe , go

":Werin , binerin bê ev çiyê."

Wan jî li ard nerîn , gotin : "Bi xwedê, me nas nekir"

23

Rabû padîşah ji xulamên xwe re go : "Vî ardî bikin hevîr , texin tennûrê, û ku bû nan , ji min re bînin."

Xulaman ew ard birin cem yê firneçî , yê firneçî ew ard kire hevîr û xiste firnê , lê dît ku hişk bû û şewitî , kire nav paçekî , li cem xwe hişt , û hin hevîrin din kire nanekî weke wî , û ew şande ji padîşah re . Yekî kor jî hebû , care dihat firnê , lê çawa vê care yê kor hat , yê firneçî ew nanê nav paçik xiste destê wî.

Yê kor birçî bû , çawa nan kete destê wî , li ber deriyê firnê xwar , çawa nan xwar çavên wî saxlem bûn , û aqilê wî jî gelekî mezin bû , derkete çolê û li gîha û kulîlkên çolê mijûl bû , diçinîn û tev lî hev dikirin , ew dikirin derman , û bû textor.

Vêca ereban nas kir ku ev textor bi gepa wî nanî bûye textor , navê wî kirin Luqman ( Luqman , ango :gep ) . Ji wê rojê de kurdan jêre digotin: )Hekîmê Luqman) , û bi vî navî bang lê dikirin.

Nav û dengê Hekîmê Luqman belav bû , û deng b wî ket .Rojekê zilamekî ku baweriya wî bi textoriya Hekîmê Luqman nedihat , ewî zilamî di nav civatê de got : "Çawa xelk baweriyê bi textoiya Hekîmê Luqman tînin ? Ez bi xwe hewcedarî wî nabim."

Hekîmê Luqman ev gotin bihîst , şand dû wî zilamî, ew zilam hate cem wî , Hekîmê Luqman jêre got:

"Çawa tu hewcedarî min nabî , ma ku tu nexweş bikevî , tuwê çawa bikî . " ?

Ewî zilamî lê vegerand : "Na ez nexweş nakevim"

-Çawa tu nexweş nakevî?

-Ez rojê carek , heftakî carek , mehê carek , û salê carek.

Hekîmê Luqman serê xwe hejand , di zikê xwe de got : "Zehmete tu hewcedarî min bibe , lê birako tiştekan tenê maye , heye ji bo wî tiştî tu hewcedarî min bibî".

Ew zilam çû , yê ber destê textor go : "Bavo , min ji vî zilamî fam nekir , evî go çi."?

Hekîmê Luqman go : "Ezê vê jî te re bêjim , lê dive ji devê te dernekeve: Rojê carek , ango : Rojê carekê ez xwarinê dixum .Heftakî carek , ango: her heftakî ez carekê serê xwe dişom - heyamê berê xelkê zû serê xwe nedîşustin – Mehê carek , ango : mehê carekê ez di çim livîna jina xwe – cem jina xwe – Salê carek , ango : salê carek ez xwîna zêde ji laşê xwe berdidim.

Min jî jêre got : Maye yek , ew yek jî çavên wî ne , heger kul bûn , ewê hewcedarî min bibî."

Piştî demeke dirêj , çavên wî zilamî kul bûn , xelkê jêre digot : "Here cem Hekîmê Luqman " , lê ew dizane ku Hekîmê Luqman derman nadî wî.

24

Ewî zilamî ji diya xwe re got : "Yadê , rabe here cem Hekîmê Luqman , jê re bêje : çavên kurê min kul bûne .Gotina Hekîmê Luqman ya pêşî ku ji te re got , ezber bike ku tu wê gotinê ji min re bêje , û guh mede gotinên wî yên din".

Rabû diya wî zilamî çû cem Hekîmê Luqman , go : "Çavên kurê min têşin."

Hekîmê Luqman pêşî devê xwe vekir , go : "Ax, dest "- di vir de ew zilam hate bîrê - rabû go:

"Dermanê sor , hêka xav , mast"

Wilo got da jinik gotina pêşî ji bîr bike , lê weke ku kurê wê gotibû, jinikê guh nedayê û gotina pêşî (Ax - dest ) ezber kir , ji Hekîmê Luqman re go:

"Xwedê temenê te dirêj bikî " , û da rê çû cem kurê xwe , go:

"Kurê min, gotina Hekîmê Luqman ya pêşî )Ax - dest ) bû , gelek tiştên dî jî gotin."

Kurê wê go : "Ez wan tiştan naxwazim were herdû destên min li pişt min girêde."

Diya wî herdû destên wî li pişt wî girêdan, 3-4 rojan çavên wî sipî sax bûn. Rabû çû cem Hekîmê Luqman, çîroka xwe jê re got, Hekîmê Luqman go : "Ez di fena tede ghiştim , lê tu ji min jêhatîtir derket. "

\*\*\*\*\*

Elî yê Çiyayî

Civatên berê ji sedî 75 gotinên wan di biwara jinê de bûn , zulm li jinan dikirin.....

Şevê yekî çîrokbêj ev çîrok ji me re got , ezê jî niha ji we re bêjim, Mihemedê Berîvanî hebû , li berriyê bû , zilamek xuyaî û maldar bû. Dostekî Mihemmed hebû jêre digotin Eliyê Çiyayî ji mirovên çiyê bû, hate cem dostê xwe ,Mihemmedê Berrîvanî gelek qedr û qîmet jê re girt

,

çend rojan li cem wî ma , berx jêre serjêkirin, û dema çû jî danake baş dayê.

Dema xatir xwest , Elî yê Çiyayî jêre got : "Birako, divê tu jî serekî bi alî me de were."

Mihemmedê Berrîvanî got : "Inşa Allah , heger li hev hat , di demeke

nêzîk de , ezê bê m."

Piştî demeke dirêj , piştî çend salan , rojekê Mihemmdê Berrîvanî , go  
":Ezê serekî herim cem dostê xwe Elî yê Çiyayî."

Mihemmdê Berrîvanî gîha cem dostê xwe , gelekî kêfa Elî yê Çiyayî hat  
,biqedr silava wî vegerand , destê wî hejand , û ew anî mal.

25

Elî yê Çiyayî zilamek şand aliyê malê go : "Here , bere berxekî serjêkin,  
û şîva me çêkin."

Mane li odê , demeke hindik bihurî , şîv hat . Mihemmedê Berrîvanî di  
dilê xwe de go : "Bavo, evî çi zû şîv çêkir û anî"?

Dema şîv hat , legenek nîsk bû , û çend nan û pîvaz jî danîne ber nan.  
Elî yê Çiyayî li ber xwe ket, serê xwe kire ber xwe , û bê deng ma , di  
dilê xwe de digot : "Evê sebava jina min ez hetikandim , ev mêvanê min  
dostê mine, û ji wir hatiye cem min , xwarina wî nîske ? ezê çawa bikim  
." ?

Mihemmedê Berrîvanî di madê mazûbanê xwe de derxist , û naskir ku  
ew gelekî li ber xwe dikeve , rabû jê re got : "Birako, kêfa min gelekî ji  
nîskê re tê, û ez bextyarim ku şîva te nîske".

Lê Elî yê Çiyayî her li ber xwe diket . Nisk xwarin, Eli yê Çiyayî ji  
Mihemmedê Berrîvanî re got : "Birako, va tu rûniştîye , karek min heye,  
qederê nîv saetê ezê li mihîna xwe siwar bim, bigihim cîkî , û ezê  
vegerim."

Mihemmedê Berrîvanî go : "Başe"

Elî yê Çiyayî rahişt tiving û rextê xwe, bi ser piştî mîhîna xwe ket, jina  
xwe li piştî xwe siwarkir û ew bir gundê mala bavê wê, ew li ser bêderên  
gund danî, her sê telaq xistin destê wê, go : "Min tu berda de here mala  
bavê xwe."

Berî wê demê bi çend salan, bavê Elî yê Çiyayî li ser destê Osman hatibû

kuştin.

Osman bavê Elî yê Çiyayî kuşt , lê piştî çend salan gelek mirov şandin Elî yê Çiyayî û doza lihevhatinê lê kir , digot : "Ku Elî yê Çiyayî di tola bavê xwe de bibûre , tiştê ku bixwaze ezê bidim , û ezê keça xwe jî bidim Elî yê Çiyayî."

Lê Elî yê Çiyayî ji ya xwe nedihat xwar , ku divê ew tola bavê xwe bistîne .Piştî Elî yê Çiyayî jina xwe gîhand gundê bavê wê , û ew berda, wê şevê berê xwe da gundê dijminê xwe Osman , gîha gund û derbas bû mala Osman , Osman çav lê ket rabû ser xwe , Elî yê Çiyayî go : "Bavo, ez nehatime kuştina te , ji cihê xwe ranebe .Te bavê min kuşt , û te gelek xelk şandincem min , ku em li hev bîn , ez jî hata niha li ser ya xwe mabûm , û ez jê nedihatim xwar . Lê niha ez hatime , cem te ku tu soza xwe bibî serî , û kaça xwe bidî min , ez di te bihurtim."

Osman bi vê gotinê gelekî kêfxweş û şad bû, û go: " Başê. "

Elî yê Çiyayî go:"Ezê niha keçikê bi xwe re bibim."

Rabû Osman şande dû melle , keça xwe li Elî yê Çiyayî mehrkir.

Elî yê Çiyayî wê şevê li mihîna xwe siwar bû , keçik li pişt xwe siwar kir û da ser rê, vegeriya mal.

Elî yê Çiyayî gîha mal , berxek serjêkir , û ji jina xwe ya nû re go : "De ji me re goşt Çêke."

26

Elî yê Çiyayî hat cem mêvanê xwe , rûnişt , û civata xwe kirin heta dawiya şevê .Xwarin hat , xwarin danî ber mêvanê xwe , Mihemmedê Berrîvanî çav li xwarinê ket go : "Birako, ma ne me şîv xwar."?

Elî yê Çiyayî go:"Ew hê zû bû, va niha nîvê şevê ye".Xwarina xwe xwarin Mihemmedê Berrîvanî go:

"Birako, ka te ji min re negot , çi karê te hebû ku te bi êvarî re ji cem min da rê."?

Elî yê Çiyayî go : "Birako, ezê ji te re bêjim çêtire tu ji hin kesin din bibhîze."

Elî yê Çiyayî çîroka xwe got , Mihemmedê Berrîvanî go : "Birako, ma ya di nav min û te de bi vî tiştî bû ku te wilo li jina xwe kir ?". Elî yê Çiyayî go : "Na, birako jina ku bi ya mêrê xwe neke mafê wê eve. "

Ji kê re ye?

Yekî xerrat , yekî terzî , û yekî olperest hebûn .Terzî û xerrat gotin : "Emê herin Diyarbekir , kar li wir heye , emê ji xwe re karekî bikin."

Yê olperest go : "Başê , va gurrîze ya min heye , ezê we bi xwe re bibim ."

Rabû yê olperest gurrîze ya xwe anî , yê xerrat birrek û depên xwe dane hev û avêtin gurrîze yê, û yê terzî jî mekîne, ta û pertelên xwe xistin gurrîze yê de, û her sê çûn berê xwe dane bajarê Diyarbekir.

Bi rê de li wan bû şev , ji hev re gotin : "Emê li vê çolê razên , û sibehê emê dîsa bi ser rê kevin."

Li wê çolê rûniştin , yê xerrat go : "Ezê hişyarbim , hûn razên , û kengî xewa min hat , ezê dey li yekî ji we kim, divê em dorê razên ev der çole û diz hene"

Yê xerrat ma hişyar , yê terzî û yê olperest razan.

Yê xerrat birreka xwe derxist , û bi depên xwe pûta keçeke xweşik çêkir

.

Yê xerrat pûta keçikê danî wir , û dey li yê terzî kir , go : "Hişyar be , va ezê razêm" û yê xerrat raza.

Yê terzî hişyar bû , dît ku va pûta keçekê li wire , rabû mekîne ta , terzî û pertelên xwe derxistin , dest pê kir û bedlek cilên spehî ji pûta keçikê re çêkir , yê terzî bedil li pûta keçekê kir , û dey li yê olperest kir , û raza.

Yê olperest rabû dît ku va pûta keçeke xweşik , bedlek li bejna wê ye, rabû sicada xwe danî , nimêj kir û dest bi lavan kir û got : "Ya reb , tu can



bixe vê pûta xweşik ".Yê olperest wilo ma heta bû sibeh.

Xerrat û terzî jî hişyar bûn , dîtin ku va can bi pûtê ve hatiye û bû ye keçik.

Her sê terzî , xerrat , û olperest pevçûn , û her yekî digot : "Ev keçik ji min re ye."

Ma gelo wê keçik ji kê ji wan re be?

27

Raman

Axak û xulamêkî wî hebûn , ji hêla Mêhdînê bûn.

Rojekê axa bang li xulamê xwe Heso kir û jê re go : "Ka em herin Cezîra Botan cem Mîr."

Axe û Heso li hespên xwe siwar bûn , û çûn berê xwe dan Cezîra botan.

Bi rê de , li wan bû şev , axe ji xulamê xwe Heso re got : "Bi Xwedê xewa min tê , ezê razêm û tu hişyar be , li ber hespên xwe be."

Piştî demekê axe ji xew hişyar dibe û bang li Heso dike , dibêje : "Heso lawo tu hişyare."?

Heso dibêje : "Erê , ez hişyarim."

-Tu çi dike?

-Ez mijûl dibim.

-Tu bi çi mijûl dibe?

-Bi Xwedê ez ji xwe re dibêjim , ma ku mirov singê hesp di erdê de dikute , axa şûna sing bi kûde dice?

-Ev ramana te qence lawo.

Axê raza , û piştî demekê dîsa hişyar bû , bang li Heso kir , go : "Tu çi dike."?

Heso go : "Ez mijûl dibim."

28

-Tu bi çi mijûl dibe. ?

-Ez ji xwe re dibêjim , ev deve van stiriye tûj dixum , çawa van bişkulên girover dikan?

-Ramana te başe , hişyar be.

Dîsa axe raza û piştî demekê hişyar bû , bang li Heso kir lê deng jê nehat , çend caran go : "Heso ... Heso ....Heso." ....

Heso ji xew rabû go : "Ha , ha."

Heso nerî ku hesp ne li wirin.

Axe go : "Tu bi çi mijûl dibe.?"

Heso go : "Bi Xwedê , ez ji xwe re dibêjim , ezê çawa rahêjim zîne van hespan. " ?

Nexweşiya şekir

Zilamek hebû jê re digotin Helîmo , demekê pezê xwe biribû nav koçeran

.

Rojekê Hizniyo çû mêvanê Helîmo , Helîmo go : "Ser çavan Hiznî , derbas be. "

Hiznî derbas bû , rûnişt , Helîmo bang li zarokên xwe kir , go : "Lawo , xalê we Hiznî niha birçiyê , jê re xwarinê werînin."

Hiznî go : "Helîmo , ku ne şêranî be , ez nikarim tiştêkî bixum ha."

-Helawa me heye û mirebba me jî heye.

29

-Gelekî başe werînin.

Hizniyo têr helaw û mirebba xwar , Helîmo bang li zarokên kir go : "Lawo

,

werin rahêjin van firaxan , û çayekê ji xalê xwe Hiznî re çêkin."

Hiznî go : "Helîmo , ez çayê venaxum."

Helîmo go : "Çima."

Hiznî lê vegerand : "Yabo , ma ne nexweşiya şekir bi min re heye ha."

Hot û Bot

Gotinek kevin heye , dema mirovek karê wî ne baş be , yan jî mala wî ne ber

hev be , dibêje : "Ez ne li Hot im û ne li Botim". Ezê çîroka Hot û Bot ji we re bêjim.

Hot û Bot navên du gundan bûn , herdu gund di berhev de bûn , çemek di

navbera wan re derbasdibû.

Gavanê herdu gundan , mala wî li Bot bû , diçû ber dewarên Hot û Bot.

Êvarî , gavan dewarên Hot didane ber xwe û diçû Hot , nanê xwe jî ji wir bi

xwe re tanî serê malê nanek dida gavan – û jina wî jî, li mala xwe , li Bot bû,

dema êvarî dewarên Bot dihatin , ewê jî diçû li nav malên Bot digeriya , serê

malê nanek ji wan distand.

Êvarekê lehî hatibû , dema gavan diçû Hot, li çem xist , lehiyê ew xiste nav

ava çem , û ew li ber xwe bir.

Darek dirrî di nav çem de bû , pêlen yê gavan li bin guhê darê xistin , û gavan

çû jora darê , cilên wî jî di jora darê de aliqîn û di ser laşê wî re hatin .Wilo yê gavan serberjêr ma daleqandî , rabû bangkir û got:

"Hê ...ji xelkên Bot werê , ez li Hot im û ji xelkên Hot werê , ez li Bot im nizanin di nîvê çem de ez belbellotim."

\*\*\*\*\*

Dizê miriyan

30

Yekî diziya kefenê miriyan fikir , her roja ku yek bimira , ewê diçû bi şev

tirba yê mirî vedikir , û kefenê wî derdixist , jina wî tim jê re digot : "Bavo dev ji vî karî berde , ma tu ji Xwedê natirse ? " , lê her wî weke xwe dikir. Çend salan bi vî karî , jina wî jî her jê re digot:

"Ev karekî pîse."

Rojekê yê diz ji jina xwe re got : "Min karekî din ji xwe re derxistiye , her miriyê ku ez kefenê wî dibim û wî tazî dikim , ez singekî jî di paşiya wî de dikutim."

Jinikê go : "Pepo , ev çiyê ? xelk dê me bi dijûnan bihetikînin , tu kefen dibe,

ma çima tu singan dixê paşiya wan."

-Na , vêca xelk dê lavan ji min re bikin.

-Çilo?

-Xelk dê bêjin : rehne li dê û bavê dizê berê.

Ne ji bavê xwe ye

Axak hebû , kurê wî ji xwe re keçeke spehî dît , keça mezinekî xuyayî bû. kurê

axê ji keçikê re got : "Hege bi dilê te be , ezê te bi xwazim."

-Keçikê got : devê tu jî sale carekê were cem min.

Çîrokbêj wilo dibêje: Keçikê wilo got û kurê axê qîma xwe bi vê gotinê anî , kurê axê keçik jî xwe re xwest û anî , şevê li cem wê raza , û ma heta sala

wî zîvirî , kurek jê re çêbû navê wî kir muhemmed elî .piştî sala wî zîvirî , dîsa çû cem jina xwe raza û ma heta salek zîvirî dîsa kurek jê re çêbû navê wî kire muhemmed seîd .di sala dawînd de xortek bi civanê kurê axê û jina

wî agah bû , di heyamê berê de xelk li ber çirê bûn , xanî reş bûn , xortê ku

bi civanê wan agah bû , berî kurê axê ji civata rabû û çû cem jina xwe jinkê

jêre got: "Ma ne me wilo ji hev re gotibû ,ne niha tu hatî cem min ?".Kurê axê go : "ha ,naxwe ez şaş bûme " ,û xwe da paş . Piştî demekê kurek ji jinkê

re çêbû , navê wî kire Muhemmed Emin.

31

Çend salan man , axe çû rehmêtê , û piştî hersê kur bûne xort , kurê axê jî

kete ber mirinê , di ber mirinê de got : "Muhemmed û Muhemmed min diwêrisînin , û Muhemmed min nawêrisîne."

Kurê axê mir , xortan doz li hev kirin bê ka wiraset ji kê re nekeve , hevdû kişandin heqiyê û gotin : "Va zilamek heye , emê herin cem wî , û ku wî çi got

,emê bi ya wî bikin."

Hersê meşyan , berê xwe dane heqiyê , bi rê de şopa deveyekî dîtin , yekî ji

wan go : "Ev deve bi çavekîye."

Yê didwan go : "Barê vê devê dimse."

Û yê sisiyan go : "Ev deve bê teriye."

Bi rêya xwe de çûn , şopa pîrekekê dîtin , yekî ji wan go : "Ev jinik xeyidiye ."

Yê didwan go : "Ev jinik kinike."

Û yê sisiyan go : "Ev jinik avise."

Bi rê de meşyan , zilamek dîtin , pêrgî wan bû , silav li wan kir , go : "Gelî camêran , we tu deve bi vê rêyê de nedîtine."?

Yekî ji wan go : "Pismam deveyê te ne bi çavekî bû."?

Ewî zilamî lê vegerand , go : "Berê"

Yê didwan go : "Ne bê dûv bû."?

Go : "Berê"

Û yê sisyan go : "Barê wî ne dims bû"

Go : "Berê welleh ,.....kanî." ?

Ewan lê vegerand : "welleh me nedîtiye."

-Hûn dê bi kûnde herin?

-Emê herin heqiyê

-Başe , ezê jî bi we re bêm.

-Başe , tu jî were.

Meşyan zilamek pêrgî wan bû , go : "We tu pêrek bi vê rêyê de nedîtine ."?

Yekî ji wan go : "Ne jinikek kinik bû"?

Ewî zilamê lê vegerand , go : "Berê"

Yê didwan go : "Ne avis bû"?

Ewî go : "Berê"

Û yê sisiyan go : "Ma ne xeyidî bû"?

Ewî go : "Berê welleh , .....kanî"?

Gotin : "Me nedîtiye."

-Hûn dê bi kûde herin?

-Emê herin heqiyê.

Başe , ezê jî bi we re bêm.

Ew zilam jî bi wan re çû û meşyan , gihane gund ,çûn mala zilamê ku heqiyê

dibire ,rûniştin ,hersê biran gotin : "heqîke me heye ,em hatine cem te "yê

heqdar ji xwediye deve re got : "Tê xêre ? ewî lê vegrand:

32

Be xwedê deve yekî min winda bûye ,ev xort nîşanên wî tevdî dibêjin ,û

dibêjin me deve nedîtye ".Yê heqdar ji wan xortan pirsî : "Çawa hûn nîşanên

devê dizanin , û we deve nedîtye."?

Ewan xortan yeko , yeko bersiva xwe dan :Yekî go : "ji ber şopa, deve di nav

zêd de bû , li aliyekî şopê , devê têr çêra xwe xwarye , û aliyê din nexwarye,

min naskir ku deve bi çavekî ye"

Yê didwan go : "bişkulên devê rêz bûbûn weke rêza morîkên tizbiyê ,min naskir ku deve bê teriya"

Û yê sisiyan go : "ewqasî em dimeşyan ,me mêş bi rê de nedidîtin ,lê ku em

gihan şopa devê ,me dît , li dor şopê , mêş rêzdibin ,min naskir ku barê devê

dims bû " Mêrikê heqdar ji xwedyê devê re go : "here , li deveyê xwe biger ,tişteki te bi van camêran re tune ye " , û mêrik zîvirî , ji mêrê jinkê re got : "te

xêre" ?

Mêrê jinkê lê vegerand : "ev xort nîşanên jina min dizanin ,û dibêjin :me nedîtye"

Rabû yê heqdar ji xortan pirsî : "çawa hûn nîşanên jinkê dizanin ,û we jinek nedîtye"?

Yekî ji xortan go : "her neh –deh gavan şopa pîrekê li pişt xwe zîvirî bû , min

naskir ku ev pîrek xeyidîn ye"

Yê didwan go "şopa lingên wê fereh avetine ,min naskir ku ev jinek avise "

Ûyê sisyan go : "ji şopa lingên wê xuyabû ku gavên wê kinin ,min naskir ku ev jînik kine ".yê heqdar ji mêrê jînkê re got :de here, tişteki te bi van xortan re tune ye"

Hesê xortan ji yê heqdar re gotin : "Bavê me kete ber mirinê ,go :muhemmed û muhemmed min diwê risînî ,û muhemmed min nawêrisîne .gelo werast ji kê re nakeve ? rabû yê heqdar bang li yê mezin (muhemmed elî)kir , ew bir çolê ,û jê re gor gotina wî ,dido ji we kurên wî ne ,tu bi ya min bikî ,laşê bavê xwe derxe bişewitîne ,û ezê wiraseta wî li te û birakî te parbikim . "Muhammed elî xeyidîn , go : "Ku ne tu ba ,mine tişteki mezin bikira , îşê min ji mal tune ye ,û ez wilo li bavê xwe nakin."

Yê heqdar bang li muhemmed se'îd kir ,weke ku ji muhemmed elî re gotibû ,ji wî re jî got , lê muhemmed se'îd jî weke muhemmed elî lê vegerand .Rabû yê heqdar bangle yê biçûk muhemmed emîn kir û ew gotin ji wî re jî gotin .

Muhammed emîn go : "bi xwedê raste ,bênamûs bû , gelacbû ,dixwaze me bi hev bi dî kuştin ,heqê wî mirov ji wilo xerabtir lê bikî".

Hatin rûniştin ,firavîn anîn ber wan , yê heqdar go : "de keremkin."

Muhammed elî go : "ev goşt herame."

Muhammed se'îd go : "ev nanê ku hatiye ber me bi xwînê hatiye stiran."



Û Muhemmed Emîn go : "Mazûbanê me , ne ji bavê xwe ye."

Mazûbanê wan – yê heqdar – çû cem şivanê pez , û jê pirsî , go : "Çiroka vî

berxê ku me serjêkir , ji min re bêje."

33

Yê şivan go : "Diya vî berxî miribû , û timî ev berx diçû , diket bin dêlikek zayî de , û ew dimêt " yê heqdar go : "Bi xwedê raste , goştê wî herame", hate

cem jina xwe û jê pirsî : "Te çawa ev nan çêkiriye ? qey te bi xwînê stiraye" ?

Jina yê heqdar lê vegerand : "Hê ...bi xwedê dema min hevîr fikir , ez bênimêj bûm , qey xwîna min ketiye nav hevîr."

Yê heqdar çû cem diya xwe , û jê re got : "Rast bêje , ez ji bavê xwe me yan na" ?

Diya wî lê nerî , go : "Bavê te zarok jê re çênedbûn , navmalîkî me hebû , şevêkê min ew berda ser xwe û tu jê çêbû."

Rabû yê heqdar serê xwe hejand , go : "Naxwe ev jî raste."

Yê heqdar vejeriya cem xortan , û ji wan re go : "Malê bavê we ji herduwên

mezin Muhemmed Elî û Muhemmed Se'îd re ye , lê yê biçûk Muhemmed Emîn , ew jî weke min ne ji bavê xwe ye."

[www.tirej.info](http://www.tirej.info)

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*\*\*

\*\*\*

|                              |    |
|------------------------------|----|
| Naverok                      |    |
| Pêşgotin.....                | 2  |
| Hate ser qûnê.....           | 5  |
| Şût û rût.....               | 7  |
| Têr û birçî .....            | 9  |
| Şivan bû keye.....           | 11 |
| Kerê boz.....                | 13 |
| Pakêt .....                  | 15 |
| Bazirganê pîvazan.....       | 16 |
| Alî bapîrê xwe ke .....      | 18 |
| Ez fêr bûm .....             | 19 |
| Hemê û ken'n .....           | 20 |
| Baqê nîska .....             | 23 |
| Ribka wî .....               | 24 |
| Wateya êqil .....            | 26 |
| Singê golikê .....           | 31 |
| Gurî bû axe .....            | 32 |
| Qala namûsa camêra meke...33 |    |
| 34                           |    |
| Hekîmê luqman .....          | 36 |
| Elî yê çiyayî .....          | 41 |
| Ji kê re ye? .....           | 44 |
| Raman .....                  | 46 |
| Nexweşiya şekir .....        | 48 |
| Hot û Bût.....               | 49 |
| Dizê miriyan .....           | 50 |
| Ne ji bavê xwe ye .....      | 51 |
| Naverok .....                | 56 |

\*\*

## SÎ ÇÎROKÊN BIJARE

|                                                                            |     |
|----------------------------------------------------------------------------|-----|
| Bijartin û wergerandin<br>Husein Muhammed<br>mehtable@yahoo.com<br>Naverok |     |
| Naverok.....                                                               | 1   |
| Bazê nêçîrê.....                                                           | 2   |
| Stêr.....                                                                  | 8   |
| Bihar û havîn .....                                                        | 14  |
| Hêlîn .....                                                                | 17  |
| Pîremêrê li ber pirê .....                                                 | 20  |
| Tawisrês.....                                                              | 24  |
| Aliyê dî .....                                                             | 32  |
| Rojavabûn.....                                                             | 35  |
| Bilbil û sorgul .....                                                      | 44  |
| Cilên nû yên paşayî.....                                                   | 51  |
| Pênc diyariyên jiyane.....                                                 | 57  |
| Mirina Baldassare Silvande .....                                           | 60  |
| Pirç nîv dinya .....                                                       | 85  |
| Odeya cewî .....                                                           | 86  |
| Bêhêvîtiya pîrejînikê .....                                                | 89  |
| Her sermest bin.....                                                       | 90  |
| Mirina şair .....                                                          | 91  |
| Bo xatirê jinê!.....                                                       | 96  |
| Li ser jiyane.....                                                         | 105 |
| Rojnivîska Mirovê Nepêwîst .....                                           | 107 |
| Çend gul ji Gulistanê.....                                                 | 115 |

|                        |     |
|------------------------|-----|
| Kuncik .....           | 127 |
| KEŞÎŞÊ REŞ.....        | 129 |
| Kefîsor.....           | 170 |
| Berfîn.....            | 174 |
| Xwelîser .....         | 186 |
| Rûvî û qirrereşk ..... | 192 |
| Rûvî û masîgir.....    | 193 |
| Sê çîrokên kurt .....  | 195 |

1

Bazê nêçîrê

Giovanni Boccaccio (1313 – 1375)

Nehem çîroka pêncem roja Decameroneyê

Filomenayê bes kir. Dema şabanûyê diyar kir ku êdî wê rojê tenê dora wê û Dioneo maye, wê bi rûkenî dest pê kir.

"Ango niha dora min ya vegotinê ye, gelî xaniman, û ez dê bi kêfxweşî vebêjim jî. Ez dê ji we re çîrokek evînî vebêjim ku ji gelek aliyan ve wek ya

berî xwe ye. Bi vê çîrokê dixwazim bo we diyar bikim ka hêza bedewiya we çend xurt e û ka çend baştir e ku hûn bi xwe evîna xwe bibexşin kesekî çiku felek yan qeder pirr car wa dike ku hûn dikevin dest hin mêran ku qet kêrî we nayên.

Wek belkî hûn dizanin, hebû - û belkî hê jî heye - li bajarê me zelamek bi navê Coppo di Borghese Domenichi, yê ku her kesî rêz jê re digirt û li bal her kesî qedirbilind bû, ne tenê ji ber malmeziniya xwe lê ji her tiştî zêdetir ji ber reftar û tevgera xwe ya bêlome. Li pîriya xwe wî herdem li gel cîran û biyanan jî li ser serhatiyên berê suhbet dikir, û bîrhatina wî, delalbêjiya wî û jîriya wî dibû sedema heyraniya giştî. Nemaze wî çîroka

Federigoyê kurrê Filippo degli Alberighi vedigot ku xortek esilzade bû û li hemû herêma Toscanayê di çekbazî û mêraniyê de yek ji yên herî baş bû û ji ber hindê delalê ber dilê keç û zeriyan bû. Ew bû dildarî jinek ciwan ya malmezin û ya dema xwe yek ji spehîtirîn û dilbijîntirîn keç û jinên Firenzeyê dihat hesabandin. Navê jinê Monna Giovanna bû lê ax li bextê reş ku jin bimêr bû. Bo ku xwe bixe dilê wê, Federigo cejn û şahiyên siwarçakiyê û şûrbaziyê û yên ji gelek cûnên din li dar dixistin û bêqam malê xwe bo xatira wê pûç kir. Lê ka Monna Giovanna çend bedew bû,

2

ew hind jî binamûs bû û bala xwe nedida cejn û şahiyên bo xatira wê dihatin lidarxistin. Taliyê Federigo hema hemû malê xwe ji dest dabû. Wî tenê zevîkek erd mabû ku bi zor pê jiyana xwe didebirand, û herwa jî bazek hebû ku yên beraberî wî bazî dibe li ti derê peyda nebin. Evîna wî ji her demê gurr û geştir bû lê dema pê hesî ku êdî hew dikare wa li bajar bijî, wî xwe vekişand xanîkê zeviya xwe û li wir dema xwe bi firrindegiriyê ve borand û bi serbilindî xwe li ber hejariyê girt.

Dema Federigo di wê rewşa kembax de bû, mêrê Monna Giovannayê nesax ket û, dema tê derxist ku mirin nêz dibe, wesiyetnameya xwe nivîsî. Ew qewî zengîn bû û kurrê xwe yê yekane kir mîrasgirê xwe lê pê re biryar da ku ger kurrê wî bêûcax wefat bike, bila Monna Giovanna, ya ku wî pirr jê hez dikir, bibe wergira malê kurrikî. Piştî bicihanîna hindê ew çû ber dilovaniya Yezdan.

Ango Monna Giovanna bû bîjin, û piştî demekê wê bar kir ser eraziyê kurrê xwe daku wek edet havîna xwe lê biborîne. Madem wa bû ku ev erazî nêzî yê Federigo bû, tişteke siriştî ye ku kurrê wê nasî cîranên xwe bû, û ev xortê mirovhez bi dilxweşî li gel Federigo bi firrinde û kûçikan dilîst. Nemaze bazê watedar yê Federigo ketibû dilê wî û dixwest ew baz bibe yê wî lê nediwêrî ji Federigo bixwaze çiku dizanî ku Federigo jî bêhed

heyranî wî bazî bû. Lê li çileyê havînê kurrik bi dijwarî nesax ket, û dayika wî bêxîb jê xemgîn bû çiku ew kurrê wê yê yekane bû û wê di dinyayê de ji her tiştî pirrtir ji wî hez dikir. Bi şev û roj dayik li ber nivîna wî rûdinişt daku xemên wî verevîne û wî dilşad bike. Herî kêr bîst car wê daxwazên kurrikê jê dipirsîn û teksîr nedikir daku wan bi cih bîne. Rojekê kurrikê gotê: "Ger bazê Federigo ji min re bînî, dayê, bawer dikim ku ez ê sax bibim." Dema Giovannayê ev bihîst, ew ket raman û pûnijan daku bizane ka çî bike. Wê dizanî ku Federigo pirr ji wê hez dikir lê herwa dizanî ku ew bi xwe li hember wî xemsar bû. "Ma gelo ez dê bikarim jê bixwazim wî bazî yê ku li gor gotinan yek ji baştirîn bazên

3

nêçîrê yên hemû dinyayê ye û di ser re jî tek kêfxweşiya Federigo ye? Ma dikarim wa xweperest bim ku tek xemrevînê wî jî jê bistînim? Wê bênavberr ev ji xwe dipirsî, û tevî ku dizanî jî ku dê Federigo bazê xwe bidiyê ger jê bixwaze, wê ti soz nedan kurrê xwe û bersiva daxwaza wî neda. Demek dirêj pê ve neçû berî ku evîna hemberî kurrê wê ser ji şik û gumanên wê stand û wê biryar da daxwaza wî bi cih bîne, çî dibe bila. Daku qedirê Federigo bigire, wê biryar da bi xwe biçê seredana wî, li şûna kesek din bişîne. Wê ji kurrê xwe re got: "Rehet be, lawê'm, û sax bibe! Soz be serê spêdeyê ez dê berî her tiştî bo te wî bazî bînim." Kurrik bi sozê wa şad bû ku wa dixwiya tawilê saxtir dibe.

Spêdeya roja din Monna Giovanna li gel jinek dî bi rê ket û qaşo bi tesadifî di ber xaniyê Federigo re borî. Seqa û hewa ne yê nêçîrê bû lew Federigo li malê di nav baxçeyê xwe de bû. Dema ew bi baxçe ve mijûl bû,

yekî ji xizmetkaran peyam gihandê ku xanim Giovanna hatiye seredanê. Ew hêbetmayî û bi dilxweşî bezî mal ve û çav ket bi Giovannayê ya ku hurmetane silav kirê. Federigo camêrane xwe li ber çemand, û xanimê

bersiv da awirên wî yên dipirsîn: "Rojbaş, Federigo! Hatim heqê wê zîyanê

bidim ya giha te dema te pirr ji min hez dikir. Diyariya dixwazim bidim te ew e ku ez û hevrêya xwe dê firavînekê li cem te bixwin." Federigo bi nefsbîçûkî got: "Delaltirîn dilber Giovanna! Ne haydar im jê ku ti zîyan ji te gihabe min lê bi hebûna te wa bextiyar bûme ku ev seredana te ya li cem min - tevî ku neçar im wek mazûvan û mêvandar nekêrhatî diyar bibim jî - bi baweriya min ne heqê ti zîyanan lê berdewamiya wê qenciye ye ya te diyarî min kiriye. Qet ne ji ber min bi xwe lê ji ber te lêborînê hêvî dikim ku nikarim te bi şeng û şayane pêşwazî bikim." Wî ji Monna Giovannayê daxwaz kir ku kerem bike hindirr û ew bir nav baxçe. Ji ber ku ti kes din tinebû li gel suhbetê bike, wî ji Monna Giovanna xwest kêlîkekê li gel jina pîr ya baxçevanî suhbetê bike ta ku ew bi xwe çavdêriya danîna sifreya firavînê bike.

4

Tevî nedarî û hejariya xwe jî Federigo ta niha pê nehesîbû ka wî çend nebaşiyek mezin kiribû dema zengîniya xwe hemî pûç kiribû. Lê niha ku wî ti tişt nebû dane ber vê xanimê ya ku wî ji bo xatira wê bi sedan mêvan mazûm dikirin ber maseyên sifreyên ji ber giraniya lezetên bihagiran li ber şkestinê bûn, niha ew tê ghişt ka wî çend bêhişî û bêaqilî kiriye, û ji dil lê poşman bû. Wî nifrîn li siûda xwe ya xirab dibarandin û bêhiş li dor xwe paş û pêş dihat û diçû lê ne pare û ne jî tiştên bihagiran didîtin ku bike gerew û rehîn daku pê firavînekê raberî vê xanimê bike. Pirr dem vekêşa û wî hê jî ti tişt nebû dane ser sifreya vê xanima nirxibilind ya wî dixwest li gor nirxê wê bide keremkirin. Li aliyê din wî ji serbilindiya xwe nedikir alîkariyê ji ti kesî bixwaze, û ku wî çavek li bazê xwe yê bihagiran gerrand, biryar da ku dawîn car wî bazî bi kar bîne. Wî zora xwe bir, baz ji lîsê wî deranî û stulk lê veçemand ji ber

ku bawer fikir ku ew dê bi dilê mêvana wî be. Wî baz bi lez da rûçikandin û ferman da ku ew di tavikê de bêt qelandin. Û paşî mêzerek çûrr-spî, ji wan yên wî hê çend lib mabûn, li ser maseyê hat raxistin, ew vegerrî nav baxçe û ji mêvana xwe ya xweşdivî re ragihand ku ew firavîna sade, ya wî pê çêdibû, amade ye. Monna Giovanna li gel hevala xwe bi wî re çûn û rûniştin ser sifreyê. Bêyî ku bizanin ka çi bû raberî wan hatiye kirin, wan bi mêvandariya merdane ya Federigo têt xwar.

Piştî firavînê wan li ser gelek mijaran suhbet kir, û paşî Monna Giovanna biryar da xwe ku taliyê suhbetê bîne ser mijara bingehîn. Wê bi dengê nerm û narîn dest pê kir: "Federigo, dema bipûnijî li binamûsiya min, ya ku ihtimal e te pirrî car wek dilreqî yan bêdiliyê hesabandibe, dibe asantir têt bigihî ka dêbav çend dildariyê qurbanî zarroyên xwe dikin, û hingê hêvîdar im dê li min biborî ku diwêrim vê daxwazê ji te bikim. Jixwe te ti zarrok nînin lê min kurrek heye, û ez nikarim ji xwe qut bikim wan hestan yên dilê her dayikê vedijînin. Lew neçar im sinorên maqûliyê bigavînim û ji te wî tiştî bixwazim yê ku li ber dilê te pirr şîrîn e çiku dixwiye ew tek tişt e ku xemên te vedirevîne û kêfa te tîne. Bi kurtî: Ez

5

bazê te dixwazim. Dilê kurrê min hind ketiye wî ku ditirsim nesaxiya wî kembaxtir bibe û kurrik ta belkî bimire ger nikarim wî bazî jê re bibim. Ji te hêvî dikim - ne ji ber wê evînê ya te hemberî min hest pê kiriye lê ji ber cewerî û camêriya te ya herdem diyar - wî bazî diyarî min bike. Hingê dikarim bibêjim spas bo merdiya te ya camêrane ku kurrê min ji merg û mirinê xilas kir, û ji ber vê qencyê ez dê herdem deyndarî te bim."

Dema Federigo guhdarî daxwaza Monna Giovannayê fikir, ew ji qehran lal bû çiku têt ghişt ku wî ji dest daye ew tek delîva jiyana xwe ya ku dikarî carekê xizmetek bikêr bo dilbera xwe bike. Ji bilî axînek kûr ti jê



nehat, û Giovannayê fam kir ev axîn wateya hindê ye ku ew nikare dest ji bazê xwe berde. Giovanna li ber bû bibêje ku ew êdî wî bazî naxwaze lê hê ew negihabû, Federigo dest bi axivînê kir: "Xanima çak. Ji wê gavê, ya ku Yezdan wa hez kir ku çirayê evîna te di dilê min de hilbibe, siûda min herdem kembax bûye, û heqdar im gilî û gazinan bikim ku felek li min xayin bûye. Lê hemî, ya ku hatiye serê min, kê m e li ber wê êş û azarê ya niha hest pê dikim, li ber vê êş û azara nayê tehemilkirin. Ca ku tu - ya li rojên zengînî û dewlemendiya min ti car piyek wê bi mala min nediket - niha hatiya û te xwe avêtiye ber mala min ya belengaz daku vê diyariya bêqedir ji min bixwazî - û ku ez... û ku ez nikarim vê daxwaza te bi cih bînim. Ca ez dê bi kurtî ji te re bibêjim ka çima nikarim. Dema min bihîst ku tu dê wa pirr qedir bidî min ku li ser sifreya min bifermî firavînê, tavilê lê pûnijîm ka çi raberî mêvanek wiha qedirbilind bikim. Bêguman min xwest baştirîn tiştê heyî bidim keremkirin, ket hişê min ku bazê min bi kêr tê ji ber ku ew xweşdivîtirîn tişt bû ku min hebû - û wisan ew bû firavîna te. Min bawer dikir ku ew baştirîn awa bû ku wî bazî bidim. Lê ku niha wî bi awayek din dixwazî, ji qehran dipeqim ku nikarim daxwaza te bi cih bînim. Bawer dikim ku ev xem qet ji dilê min dernayê." Daku Monna Giovanna ti şikan ji gotinên wî nebe, çû nikil û nînokên wî anîn û danîn ber piyên wê.

6

Dema Monna Giovannayê mesele jê bihîst, pêşî lome lê kirin ku wisan bazê xwe kuştiye lê pirr dem pê ve neçû ku wê êdî nikarî nebe heyranî wê

merdiya wî ya hejarî û nedariyê nikarîbû kê m bike. Lê ku ji ber vê sedemê wê êdî ti hêvî nemabû ku daxwaza kurrê xwe bi cih bîne û ji ber ku ew xemxwerî nesaxiya kurrê xwe bû, bi dilek bi derdan dagirtî vegerrî

mala xwe. Ca sedem xeyalşkestina ji ber bidestnexistina bazî be yan jî nesaxî ji cûnek wa be ku encama wê dê her mirin ba, herhal kurrik piştî çend rojan mir û kul û kovanên dayika xwe pirr giran kirin. Monna Giovannayê heyamek pirr dirêj şîniya kurrê xwe kir lê ji ber ku hê ciwan bû û bûbû xwedî mîrasek mezin, birayên wê dest pê kir jê daxwaz kir ku dîsan bizewice. Pêşî Giovanna dijî hindê derket lê wan bela xwe jê venekir.

Û dema lê pûnijî ka Federigo çend pirr jê hez dikir û çî mêranî kiribû ku bazê xwe yê fêris gorî wê kiriye, wê ji birayên xwe re got: "Ger hûn destûrê bidin, qet ne dijî hindê me ku ta dawiya jiyana xwe bîjin bijîm. Lê ger hûn îlle bixwazin ku bizewicim, hingê ez dê Federigo degli Alberighi - lê qet ne ti kes dî - bibijêrim." Birayên wê tinazî bi vebijarka wê kirin: "Ca ew bo çî ye?" ew jê pirsîn. Lê wê bersiv da: "Birayên delal. Dizanim ku ew ne zengîn e lê bo min zelumê bê zengînê çêtir e ji zengîniya bê zelum." Bira tê ghiştin ku wê ji dil biryara xwe daye, û ku ew jê agadar bûn ku Federigo camêrek bû ku bi şeref xwe li ber barê belengaziyê ragirtibû, wan xwişka xwe da wî û hemî mîrasê wê li wan kir next û qelen. Piştî Federigo li gel wê xanima hind pirr jê hez dikir zewicî, ew êdî bo camêrek yê ku dizanî baş sereguhiya mal û maliyeta xwe bike. Ew û jina xwe ya binamûs û pêbawer hê çendî çend salan bi hev re jiyân."

Wergerandin: 01/2004

7

Name ji Aşê Min

Stêr

Alphonse Daudet (1840-1897)

Çîroka şivanek provenceyî

Hingê, dema min li çiyayê Luberoll şivaniya lawiran dikir, carinan bi

hefteyan wext derbas dibû bê ku benderuhekî bibînim. Ez li çerîngehan bi tenê bi seyê xwe Labr û miyên xwe re bûm. Geh tenêtîperestê Mont-de-'Ure di wan deran re diborî û li giyayin derman digerî, geh jî wisan dibû ku min serçavên tenîgirtî yên koçerekî didîtin; lê ew mirovên cahil û bêpêjnîxwaz bûn û haya wan ji bayê felekê û galegotên gund û bajarên geliyan tine bû û ew ne axivînxwaz bûn. Loma bi rastî bextiyar bûm dema min du hefteyan carekê dengê zengilên hêstira xanedanên xwe dibihîst dema ew bi evrazî re hildiket û min didît ku kurikê berdestk ê malê yan metê Norade ji pişt betenê xwiya dibû daku ji min re dîsan xwarin û pêxwarina du hefteyan bîne. Min bi mereqdarî nûçe-mûçeyên gundên gelî ji wan dipirsîn, min dixwest bizanim ka kî bûye, kî miriye, kî maye lê herî zêde bala min li ser dotzeriya malmezina min Stephanette bû ku bedewtirîn keça hemû cîhana min dîtî ye. Min dixwest balkêşiya xwe diyar nekim loma min bi awayek din rewşa wê dipirsî: gelo ew xweş diçû dîlan û şahiyar, gelo her kesên nû dihatin xwazgîniya wê; û heke niha kesek ji min bipirse ka ji min peritîrebenokê şivanê çiyayî re çî, ez ê bibersîvinim ku xort bûm û Stephanette bedewtirîn ronahî bû ku min li erd û asmanan dîtiye.

8

Yekşemekê, dema bendewarî xwarina xwe bûm, ew nehat. Danê spêdeyê

fikirîm ku dibe ji ber nivêja dirêj a roja pîroz be. Nîvro bahozek bihêz rabû û ji xwe re ramîm ku hêstirê nikariye bimeşe çiku rê herrî ne.

Dawiyê li derdorî sêyê, dema asman hedinîbû û çiyageha baranê daşûştî li ber rojê diteyisî, min ji nav şepîna xunavên baranê yên ji çilûyê daran diketin û ji nav xwişîna robarên baranê boşkirî dengê zengilên hêstirê, ku mîna dengê zengilên dêrê li roşanên hêkane û paskalyayê rewşen û

şeng bû, sihirand. Lê siwar ne kurikê berdestk û ne jî Noradeya pîr bû. Ew... ma hûn dizanin kî bû! Dotzeriya malmezinan bi xwe bû. Ew bi şepalî di navbera zembîlên ji şivan çêkirî de siwar bû û gep û alekên wê ji ber bayê hên ê çiyayîn sor û hinarî bûbûn.

Kurikê berdestk nesax bû û Noradeya pîr jî li betlaneyê bû û çûbû cem zarokên xwe. Stephanetteya şirîn ev hemû yek di wê navberê re ji min re got dema ji hêstirê dihat xwarê û diyar kir ji ber wendabûna xwe ya bi rê ve dereng bûye lê bi cilên xwe yê cejn û şahiyar, gulîbendek bi pirçê ve, bi kiras û tentene û dantêlên xwe yê rengvekirî wer dixwiya ku ne li nav daristanan sereder nebûye lê li govend û dîlanan gîro bûye. Ya Yezdan, çi afirandiyek dilhebîn bû! Çavên min ji bejnûbala wê venedibûn! Ku rastiye bibêjim, min ew ti caran wiha ji nêz ve nedîtibû. Carinan zivistanê, dema celeb ji zozanan berî deştê hatibû dan û ez êvaran diçûm di xanî ve şivê bixwim, dibû ku ew di xanîkê em lê re biboriya bê ku ji berdestkan re gotinekê jî bibêje, hertim cilên xweşik lê bûn û piçekî jî serbilind bû... Lê niha ew li ber min bû mîna ku tenê ji min re be; ma êdî çi ecêb ku heke serê min hinekî gêjole bibe.

Ku Stephanette xwarin ji selikê û ji nav mêdekê derxist, wê dest pê kir bi mereqdarî li derdorên xwe nerî. Dangên fîstanê xwe yê cejnan hilda daku pîs nebe û ket hindirê kotana miyan. Wê dixwest wê quncikê bibîne ya doşeka min a ji kayê ya bi pîstê miyan niximandî, ketanê min ê

9

biserkulav, gopalê min ê şivanan û çifteya min lê bîbîn. Vê hemû yekê bişirek da ser rûyê wê.

- Tu li vir jiyana xwe diborînî, şivanê reben. Ma çawa sebra te tê ku bi tenê yî? Tu çi dikî? Çi difikirî?

Min dixwest bibersivînim: "Li te difikirim, zerîcanê", û hingê min ê qet

derew nekira lê wisan heyirî bûbûm ku zimanê min nedigerî. Bawer dikim wê tê derdixist lê dixwest bi pirsên xwe hê zêdetir min matmayî bihêle:

- Pa xweştiviya te, tu carinan sera wê didî? Bawer dikim ew bizinek zêrîn e yan jî keçperî Estrella ye ku tenê li gupik û lûtkeyên çiyayan dimeşe... Lê li wir, dema henek dikirin û dikenî, ew bi xwe dişibî keçperî Estrellyê, û ku diviyabû ew zû ji wir biçê, hemû hatina wê mîna xwiya bûna çîrokekê bû.

- Bi xatirê te, şivano.

- Xwedê bi te re be, zerîcanê.

Û wiha ew, selikên vala di destan de ket rê.

Dema ew wenda bû ser rêya bi betenê ve sernişîv diçe jêr, wer dixwiya ku

kevîrên ji bin simên hêstirê digindirîn û girêl dibûn yek bi yek bi dilê min diketin. Min demek dirêj, dirêj çûna wê bihîst; û hemû rojê ji min re wisan bû mîna ku di xewê de bim bê ku biwêrim xwe vebilivînim jî daku dîmenên vê xewna şirîn ji dest nedim. Êvartir, dema hengur û tarîgewrikê xwe da gelî, û miyan bi mehe-mehkî xwe dakişand nav hev re,

min bihîst ku bangî min tê kirin û min dît ku zeriya me dîsan vedigere, vê carê ne wek berê rûken lê ji ber sarma û tirsê lertzok û şipîşil. Diyar bû li jêrî şkêreyê çemê Songue piştî şirrebaranê boş bûbû û di ser re avêtibû

10

û ku kê mabû Stephanette dê bixeniya dema ji bo derbasbûnê li hember herikê li ber xwe dabû. Herî xerab: êdî vê dema êvarê veeger nedihat hesabê çimkî keçzeriyê dê di jiyana xwe de nikariya li avek wiha derbas bibe, min ê jî nikariya pez tikîtenê bihêlim. Wê fikirê, ku diviyabû

ew bi şev li çiya bimaya, ew pirr tengezar dikir, bi taybetî ji ber ku malikî ji ber wê dê şepirze bibûna. Min di aramkirina wê de teksîrî nekir:

- Şevên tîrmehê kurt in... Tenê kurtebîskekê...

Û min bi lez û bizav agirek gurr û geş hilkir daku ew bikare lingên xwe û cilên xwe yên şipîşil ziwa bike. Paşî min şîr û penîrê miyan anî ber wê lê keçika reben ne razî bû pariyekî bixwe û ne jî xwe germ bike, û ku min rondikên pîvdanokî li ser gepên wê dîtî, girî hat çavên min jî.

Di wê bûbû tarî. Êdî tenê sorîgewrikek mijîn li gupikên çiyayan li hêla roj lê avabûyî dima. Min tembî keçzeriyê kir ku li kotana miyan xwe pal bide. Ku min pîstek nû yî bedew jê re li ser kaya paqij raxist, ez bi xwe derketim û li ber derî rûniştim... Asman govan û şahidê min e ku tevî şewata agirê evînê di demarên min de jî, ti mebestek xerab hema neket dilê min jî. Di dilê min tenê serbilindiyek mezin hebû dema diramîm ku li quncikek kotanê, hema li rex celebê min ê bi mereqdarî lê dinerî, keça malmezina min mîna ji berxikên ez şivan berxika bihagirantirîn û sîstirîn li wir paldayî bû. Ti caran mîna hingê asman ji min re ne wisan berfire û stêr jî geş bûne... Di gavekê de deriyê kotanê vebû û Stephanette hat derê. Wê nedizanî li wir binive. Miyan bi xwequlipandinê re ka dixijxijand û di xewê de dimehmehîn. Wê pêtir dixwest bê ber agir. Loma min ketanê xwe di ser milên wê werkir, agir gurrtir kir, û em herdu li wir li rex hev û bêdeng rûniştin. Heke hûn carekê jî bi şev li bin li ber ronahiya stêran mabin, hûn dizanin ku dema yên din radikevin, di tenêtî û bêdengiyê de cîhanek cihê, cîhanek razdar û nehîn vedijî. Hingê kanî bidengtir dilemelemin, li lîçên avê çirûskên biçûk hildipeqin. Giyanên çiyayan azad digerin, û hewa tijî vizevizek dengnizm e mîna ku mezinbûna pel û giya

11

bê bihîstin. Roj dema afirandiyên jîndar e lê bi şev xwerist û xwezaya ne jî

jî şiyar dibe. Heke yek fêr wê yekê nebûbe, ew jê ditirse... Stephanette jî hertim direcifî û bi bihîstina qirçepirçekê jî xwe dida ber teniştî min. Qîrînek dirêj, hawarek keserkûr a li hewa dilerziî ji gerrîka avê ya li jêr diteyisî hat. Di heman demê de berqa xuricîna stêrekê li raserî me, li hêla wê nalînê xemilî, mîna ku wê hawarê ronahî bi xwe hilgirtibe.

- Ew çi bû? Stephanette hêdî pirsî.

- Giyanek bû ku raguhezî biheştê, min bersivand û navê Xwedê anî.

Wê jî wisan kir û bîskekê bi heyranî çavên xwe li asmanan gerandin. Dû re got:

- Ango rast e ku hûn şivan zanewer in?

- Qet na, zeriya delal. Lê nêztirî stêran dijîn û ji deştiyan baştir dizanin ka li jor çi diqewime.

Wê hê jî fedikir asman, ketan di milan werkirî, mîna keçşvanek biçûk a asmanî.

- Aax, çend gelek in! Çi bedew in! Min ti caran wiha pirr stêr nedîtine... Tu navê wan dizanî?

- Belê... Binere, li wê dera han li raserî me Rêya Yaqob Ewliya ye (Kadiz). Ew ji Fransayê rasterê diçe Îspanyayê. Yaqob Ewliyayê Galizyayê ew nîşanî wir kir daku rê nîşanî Charlemagnê Mezin ê çeleng bide dema ev çû şerê saraseniyan. Li wê deran han, dûrtir Erebeyên Giyanan û çar xirxalên wan ên biriqdar in. Ew sê stêrên han ên li pêşî wan Sê Bargir in, û ya biçûk a li teniştî ya sêyem jî Ajovan e. Dibînî ka çi baranek stêran li derdorî wan dadibare? Ew giyan in ên ku Yezdan nagire cem xwe... Ya li wê dera han, hinekî jêrtir Sêtilk ango Sê Mîr (Orîon) e. Ew ji me şivanan

12

re demjimêr e. Tenê ku berê xwe bidimê, niha jî dizanim ku nîvşev derbas bûye. Hinekî datir li hêla başûr Yohenneyê Mîlanoyî (Sîrîus),

pêtalhilgirê stêran dibiriqe. Li ser wê stêrê şivan çîrokekê dibêjin. Wisan qewimî ku şevê ji şevan Yohenneyê Mîlanoyî, Sê Mîr û Rekeha Mirîşkan (Hirça Mezin) vexwendiyên stêrdostekî bûn. Rekeha Mirîşkan, a ku herî zêde xwe lezand, pêşîn çû û rêya jorîn bijart. Li wê dera han li jor, hema li lûtkeya asman binere. Sê Mîr bi rêya jêrtir ve meşîn û gihan wê lê Yohenneyê Mîlanoyiyê keslan û tembêl ji xewê şiyar nebûbû, pirr li peyên din ma û xeyidî loma gopalê xwe li wan dawêşand û xwest wan bigire. Loma Sê Mîr bi navê Gopalê Yohenneyê Mîlanoyî jî tên nasîn... Lê ji stêra bedewtirîn a me bi xwe ye ango Stêra Şivanan (Venus) ku li spêde û berbeyanê, dema em terş diajon çerîngehan û dema em wî tînin mexelê jî,

ji me re dibiriqe. Em jê re Lovyanka Maguel jî dibêjin, Lovyanka Maguel a bedew ku radihêle Peterê Provenceyî (Saturnus) û her heft salan carekê pê re şû dike.

- Çi? Ma stêr jî şû dikin?

- Belê, belê.

Lê ku tê koşim jê re ravebikim ka ew zewacên stêran çawan in, min hest pê kir ku tişteke nerm, tişteke pak bi nermî li ser milê min e. Serê wê yê li ber xewê xwe spartibû min, û bend, tentene û pirça wê ya pêldar xijxijek şirîn dikirin. Ew li wir, xwe dayî ber milê min raket û nelivlivî jî ta stêrên li asman neçilmisîn û rojek taze ew ji ber çavan ranemalîn. Min lê dinerî ka ew çawa li wir razabû û di nava min de hinek nearamî hebû lê wê şeva têrstêr, a ji bilî hestên bedew ramanek din di min de hilnedida, ez disitirandim. Li derdorê me stêran, mîna celebek boş î sernerm, li ser rêya xwe meşa xwe didomandin, û carinan hema ji min re dixwiya ku yek ji wan stêran, ya bedewtirîn û zelaltirîn, rêya xwe wenda kiribû û xwe dabû ser milê min û nivistibû.



Bihar û havîn

Juhani Aho (1861 - 1921)

Pêşî ew wek evîna du ciwanan e. Ew hîn, zelal û pak e. Ew ne agir û gurr e lê geş û ronîdar e. Lê taviî şirrebaranek ji esmanê gewrbûyî lê dide; bayek tezî avê dişilqîne û deviyar hildiçirîne; hemû dinya bêçare dixwiye mîna ku li şûna havînê payiz hatibe û her tişt lêb û xapandin be...

"Çivîka reben, bila tu mabayî li warên xwe yê her-havîn. Ma kê got te were vir bimire... Li vir tenê xem û rondik û recif hene, û tav wenda dibe nav mija şevîn."

Lê xem wek xemê nayê hesabê, dil naşkê û cî nade tarîtiya şevê çiku li der her ronahî ye. Ê ew ronî jî her ji wî cî têt yê zivistanê tarîti jê dihat. Her spêde ew zêdetir dibe, roj bi roj nêztir dibe, perdeyan ji ser xwe vedide û - mîna xwe veşartibe - virt xwe dide der.

Ê spêdeyekê wa ye qey evîn hatibe ragihandin, wek nîşanê hatibe birrîn. Deryaçe aram û bextiyar e, giya serê xwe hilaniye, spîndar dibişkive, firinde distrin, ji spêdeyê ta êvarê çû-çûya çivîkan e, axa zeviyan şiliya xwe hildifûrîne, rûbar bi xwişexwiş û lemelem in, terşûtewal derdikeve çerîngehan, li nîvgiravekê bilbîlek li hindavî lehiya avê dixwîne, av dilerize - û sirişt gustîlkan diyarî biharê dike.

14

Hewa germ û nerm e, ewrek tenê jî li esmanan peyda nabe, dil dixwaze ji

xweşiyar tilîliyan vede. Ne sar e û ne jî direcife, tenê hest bi şadiya jiyane dike.

Lê hewa hê germtir dibin, tav derdorê dihemêzîne û dihedirîne, her spêde hetav berbangaya xwe firetir vedike û dinyayê xurttir digivêşe koşa

xwe, şarayîtir dimaçîne û gep û alekan lê disincirîne. Firrinde dikevin lîstik û baziyên xwe, ji gupikên daran ta reh û rîşên tirraşan bi hev re qulîpankan li xwe didin, pêşû-mêşû şiyarî vizevizînê dibin, masî li beravên mêrgên tavîn didin pey hev, pepûk bi duawazî dikû û hewa miştî keftûleft û deng û pêjnan e. Pelên daran mestane çengên xwe vedikin. Şerava erdê dikeve hinavî gilyazan, gul wê bêhed dinoşin, ax rengên geş dide wan - û sirişt haziriya dawet û dîlana afirandiyên xwe dike.

Ew hê armanca xwe fam nakin, hê tê nagin ka çi ye wan nearam dike. Ew bişkivîn e ku digihe, ew tovê gulê ye ku di qalika xwe de amade dibe, ew nifşek e ku dixwaze xwe bigîne hemêza yê dî. Ê her geştir dibe şîniya esman, her şêntir dibe beten û berroja darên peldar, her rengîntir dibe mêrg û çîmena guldar, her teyisoktir dibe dûrahî... Lê dîsan mijdartir dibe sersînga esman. Ê li paş mijê ewrên qehweyiye vebûyî diperçivin. Ew jî mîna gulên gir yên li ber bişkivînê bicoş û dilgerm in. Ew berhewa dimeşin û li hev rast tînin û bi hevbûnê mezin dibin. Êdî giran dibin û nikarin bilivin; li ber daketinê ne. Êvarê pelate dibin lê spêdeyê êdî ji duh jî girtir in, bi zorê xwe digirin.

Giyanê kulîlkan yê bîndar di ser ax û avan re belavî nav daristan, mêrg û zeviyên dibe. Sirişt mîna dîwana dîlanê distre. Dest destan digirin, gep li gepan digerin, dev li devan, û lêv xwe raberî lêvan dikin.

Birûsk ji esmanan dişirqin. Rûyê erdê wek rûyê rengguher yê keçzeriyan reş dibe û geş dibe. Ewr xwe diavêjin hemêza hev û ji hemêzandina wan

çiya digurmin û gelî bersivan didinê. Ew strana zemawendê ye, sirûda markirinê ye, û baran morîk û mircanan dadirijîne ber nivîna bûkaniyê. Şeva kurt ya ewrîn hawirdor hêmin û hênik dike. Sirişt bêpêjn dinive, nalive, naqeliqe, bi kirpekê jî xwe ranagihîne.

Spêde êdî bayek nerm û pak tîne. Bi rêkî gupikên daran dihejin, dextlûdanê zeviyê hêdîka dadiçeme, pêl bi xweşrêzî dişilqin, û dêmê siriştê jidil e. Dema nîşaniya wê bi dawî hatiye, kêlîkên şadiyê borîne, wê zemawenda xwe kiriye û meha xwe ya hingivîn borandiye. Niha tovê xwe hildigire, berhemê xwe hildibere û xwe amadeyî armanca mezin dike: hilçinîn. Bihar çûye û havîn hilhatiye.

Ji fînî: 5/2003

16

Hêlîn

Bjørnstjerne Bjørnson (1832 - 1910)

Mala Endre bû navê wî gundikê varê û bi çiyayên bilind dorpêçkirî. Gelî rastgeh û biber bû lê çemek fire yê ji çiyayan ew ker dikir. Ev çem dirijî deryaçeya li binê gund, cihê meydanek berfire.

Bi belemê bi deryaçeyê ve hatibû yekem kes yê ku ev dever çandibû. Navê wî Endre bû, û rûniştvanên gund dûndeha wî bûn. Hinan digot ku ew piştî kuştina kesekî revîbû vir lew ûcaxa wî wa reşbîn bû. Hinan jî digot ji ber çiyayan e ku wa bilind in ku ta li nîvroyên nîveka havînê jî tav li gelî nade.

Hêlîna xertelekê li raserî gund hebû. Ew li ser lêva zinarekî li rizdeyek bilind yê çiya hatibû çêkirin. Her kesî dikarî bibîne dema xertela mê dadida ser hêlînê lê kesî nedikarî hewa bikeve wir û xwe bigihîniyê. Nêrexertel teşîrêsk li raserî gund dikir, geh xwe di berxekê werdikir, geh di karikekê; carekê wî ta zarokek biçûk jî revandibû. Lew li gund aramî peyda nedibû hindî ku ew hêlîn li wir ba. Xelkê digot ku berê carekê du birayan xwe gihandibû hêlînê û ew xirab kiribû. Lê vî zemanî kesî nikarîbû xwe bigihîniyê.

17

Çi cara du kesan li gundê Endre hev dîtiba, suhbeta wan rikrast diçû ser hêlînê û wan serê xwe radikir û li wê dinerî. Wan ew hemû dizanî ka xertel kengî piştî sersalê vegeîbûn, ka wan li kû xwe di erdê werkiribû û ziyar kiribû û ka kî dawîn car tê koşîbû hewa bikeve hêlînê. Kurran hê ji zarokî ve xwe dielimand hilketina bi dar û zinaran ve daku carekê wek wan herdu birayan hilbikevin hêlînê û wê xirab bikin. Li dema çîroka me Leif fêristirîn xortê gundê Endre bû. Ew ne ji xelkê gund bû, pirça wî xelex û çavên wî hûr bûn û ew di hemû pêşbazîyan de jêhatî bû û dilketiyê keç û zeriyan bû. Wî hê ji zû ve pesna xwe dida ku dê carekê bigihe hêlînê, lê yê pîr texmîn dikir ku ya baş ew e ku bi hindê methên xwe neke.

Van gotinan ew zivêr dikir, û hê berî ew bibe zalam, wî xwe li hêlînê cerriband. Yekşemek zelal ya berhavînê bû; diyar e têjik ji hêkan derketibûn. Bi komên mezin xelk li binê rizdeyê çiya civîbûn daku lê temaşe bikin. Yê pîr ew hişyar dikir û yê genc ew def dida berev hewaketinê. Lê wî tenê guh dida daxwaza xwe, sekinî ta ku mêxertel ji ser hêlînê firrî, kurrik xwe hilavêt û li bilindiya çend bermilan şorr ma. Ew dar li kendeke zinaran bû û kurrik dest pê kir pê ve hilket. Ber û kevirk ji ber piyên wî vediresîn, ax û xîz gîrrêl dibû xwarê. Wek din ti deng nedihat. Tenê xwişîna dengnizm ya bênavbîr ya çem dihat bîstin. Tawilê rizde dewr da. Kurrik demek dirêj bi destekî ma, piyên wî ji ber diçûn û wî nedikarî baş bibîne. Gelekan, bi taybetî jinan, berê xwe jê girt û got ku wî dê wiha nekira ger dêbavên wî sax ban. Lê taliyê wî xwe gihand bineciyê. Lê car destek wî û car piyek wî sist dibû û kurrik dihilîsî lê cardî jî xwe pê ve dişidand. Yê li jê dengê lêdana dilên hev dibîst. Hingê keçikek zirav, ya ku bi tenê li ser kevirê rûniştî bû, rabû ser xwe. Wê destê xwe dirêjî jor kir û gazî kir: "Leif, Leif, çima wa dikî?" Hemû li

wê zivirrîn, bavê wê li tenişt wê rawestî bû û hişk lê dinerî lê keçik pê nedihesî. "Were xwarê, Leif", wê bang kirê. "Ez ji te hez dikim. Tu bi hewaketina wir ti tiştî bi dest naxî.!" Xelk pê hesî ku kurrik li pêşniyaza

18

wê fikirî, çend kêlîkan rawestî lê paşî hewaketina xwe domand. Dest û piyên wî xwe baş zeft dikirin lew demek dirêj her tişt baş meşî lê paşî westînê dest pê kir ji ber ku kurrik pirr car radiwestî. Kevirkek gindirî jêr. Ew mîna pêşbîniyê bû; hemû kesên li binê rizde lê nerî ta kevir ket erdê. Pirraniya wan êdî xwe ranegirt lew ji wir pelate bûn. Tenê keçik hê li ser kevirê bilind sekinî bû, destên xwe dihejandin û li silal dinerî. Leif tê koşî bi destekî xwe bi rizde ve zeft bike lê destê wî dahilisî - keçikê baş dît - wî da xwe bi destê din lê ew jî daxijikî. "Leif", keçik wa bilind qîjî ku çiya deng veda, û hemûyên din jî beşdarî qîjîn û qîrrînê bûn. "Ew ê bikeve!" ew qîrrîn, û jin û mêran destên xwe ber wî ve dirêj kirin. Belê, ew

dahilisî, zîx, ber û ax li gel xwe da-anîn, hê jî datehisî û hê lezgîntir dahat. Mirovan berê xwe jê girt, wan bîst ka çawan qajînek dirrinde ji rizdeyê çiyayê li pişt wan hat û ka çawan tiştekan giran mîna gumtilek axa şil şepî erdê.

Dema wan dîsan wêrî awir bidinê, wan dît ku kurrik bi erda li binê rizde ve wa merriçîbû ku êdî nedihat nasîn. Keçik li ser kevir daketî bû, û bavê wê ew rakir û bir.

Xortan, ku herî zêde Leif ber bi hewaketinê pal dabû, hema newêrî li hawarê biçin, hinan ta newêrî lê binerin jî. Hingê yên pîr neçar man dest biavêjinê. Zalamê herî pîr, dema dest avêt kurrik, got: "Mixabin ku ev bi serî hat - lê" wî lê zêde kir, "baş e ku tiştekan wa bilind heye ku her kes nikare xwe bigihîniyê."

Pîremêrê li ber pirê

Ernest Hemingway (1898 – 1961)

Zelamek pîr yê xwedî berçavkên milbendpolayî û cilên tozgirtî li rex rêyê rûniştî bû. Di ser çem re pirek berdemkî hatibû çêkirin û erebe, tirimpêlên barkêş, zelum, jin û zarrok di ser re derbas dibûn. Erebeyên hêstir û qantiran dikişandin hejhejokî bi evraziyê betena ber beravê ve hildiketin û eskeran bi defdanê alîkarî wan dikir. Kamyonan pirr hêz dida ta ku bi betenê ve hildiketin û ji wir dûr diketin û gundî pî ta bi gozekan di nav tozê re dimeşîn. Lê yê pîremêr li wir bê livîn rûniştî bû. Erkê min ew bû ku li pirê derbas bibim, stasyona serekî ya ber pirê seh bikim û tê derxim ka dijmin gihaye kû derê. Min wa kir û di ser pirê re vegerrîm. Erebe kêmbûbûn û yê bi piyan dimeşîn jî tenê çend kes diyar mabûn lê yê pîremêr her li wir bû.

- Hûn ji kû tên? jê pirsîm.

- Ji San Carlos, wî got û bişirî.

Ew bajarê wî bû lew bilêvkirina wî navî dilxweşî dayê û ew bişirand.

- Min heywan xwedî dikirin, wî ravekir.

20

- Tu bi Xwedê kî, min hinekî ecêbgirtî got.

- Welle, wî got, - jixwe ez li ber heywanan mam. Dawîn kes bûm ku ji bajarê San Carlos revî.

Ew ne dişibî şivanan û ne jî gavanan. Min li cilên wî yê reş yê tozgirtî, li rûyê wî yê ji tozê gewr û li berçavkên wî yê milbendpolayî nerî û jê pirsîm:

- Çi heywan bûn?

- Heywanên cor-cor, wî got û serê xwe hejand. - Neçar mam wan bihêlim. Min li pirê û dîmena wek deverine efrîqî dixwiya çavek gerrand, pûnijîm ka hê gelek maye bo dema em dijmin bibîn, min guh dida dengên pêşîn yê nîşana wê bûyera têr-raz in ya navê wê hevgehîn, û yê pîremêr hê jî li wir rûniştî bû.

- Çi heywan bûn? pirsîm.

- Sê cûn heywan bûn, wî got. - Du bizin û pisîkek û çar cot kotir.

- Ango neçar mayî wan bihêlî? pirsîm.

- Belê. Ji ber agirê topan. Fermandar ferman da ku ji ber agirê topan birevim.

- Ma te ti kesûkar nînin? pirsîm û min nerî serê dî yê pirê, cihê hê çend erebeyên dawîn bi lez û bez bi nişîviya betena beravê ve dadihatî.

- Na, wî got. - min tenê ew heywan hebûn. Bêguman kitik ne di ti tengasiyê de ye. Pisîk dizanin matî ji xwe bikin lê nizanîm ka dê çi bi serê yê dî bêt.

- Bi siyasî tu çi yî?

21

- Ez li kû û siyasî li kû, wî got. - Ez heftê-û-şeşsalî me. Deh-dazde kîlometreyan meşîme lê bawer nakim zêdetir bikarim.

- Ne baş e li vir bimînî, min got. - Ger bikarî bi vê rêyê ve xwe bigihînî ser rêya Tortosayê, li wir dê kamyon hebin.

- Ez ê hinekî bisekinim, wî got, - û paşî biçim. Ew kamyon kû ve diçin?

- Berek Barcelona yê.

- Ez li wê hêlê ti kesî nanasim, wî got, - lê malava bî. Her malava bî.

Wî bê liv û westiyayî li min nerî û paşî - ji ber ku diviyabû xema xwe bi kesekî re parve bike - got: Ya pisîkê, ew dê her debara xwe bike, jê

piştrast im. Ne hewce ye ji pisîkê xeman bixwim. Lê yên dî. Gelo bi baweriya te halê yên dî dê çawan be?

- Êê... bawer im ku dê debara xwe bikin.

- Tu wa bawer dikî?

- Çima na? min got û nerî berava dijber, cihê êdî erebe lê nedihatin dîtin.

- Lê gelo dê çi bi serê wan bê li ber agirê topan madem ferman hat dan ku divê ez jî birevim?

- Te deriyê rekeha kotiran vekirî hêla?

- Belê.

- Madem wa ye, ew dê jê bifirrin.

- Belê, ew dê ji xwe re bifirrin. Lê yên dî. Hema baştir e li yên dî nepûnijim jî, wî got.

22

- Ger te bêna xwe vedabe, ez tu bim, dê niha biçim, min şîret dayê. - Niha rabe û bi rê keve.

- Malava bî, wî got û rabû piyan, bi herdu aliyan ve vehejî û paşî daket erdê û rûnişt.

- Min tenê heywan xwedî dikirin, wî betilî got lê êdî ne ji min re. - Min tenê heywan xwedî dikirin.

Ji min nedihat ti bo wî bikim. Yekşem bû û faşist ber bi Ebro pêş diketin.

Rojek gewr ya ewrîn bû û ewr wa nizm û şorr bûn ku firrokeyên wan ne li hewa bûn. Ev yek û ew yek ku pisîk dikarin bi xwe debara xwe bikin tek tişt bûn ku wî pîremêrî dikarî pê bextiyar be.

Wergerandin: 01/2004

23

Tawisrês



Hermann Hesse

Mêvan û dostê min Heinrich Mohr ji meşa xwe ya êvaran ve gerîbû û em li

odeya min a xebitînê li ber ronahiya dawîn a êvarê rûniştî bûn. Li ber pencereyan deryaçeyek berfire vedibû ku peravên tehtîn bi teşetûjî dorpêç dikirin. Ji ber ku kurê min ê biçûk aniha şevxweşî li me kiribû, em li ser zarokan û bîranînên zaroktiyê dipeyivîn.

- Niha ku min zarok hene, min got - hin ji mijûliyên min ên dema lawîniyê vejîne. Loma min berî qasî salekê dîsan dest bi berhevkirina pelatînkên kir. Tu dixwazî berhevoka min bibîn?

Wî bi erênî bersiv da û ez çûm çend qutiyên kartonî yê sivik anîn. Dema min ji wan a yekem vekir, ji me herduyan re diyar bû ka çend tarîgewrik bû: hema me derxet û sinorxîçên pelatînkên bi sêlikan ve girêdayî nedidîtin.

Min dest avêt lampeyê û zilikek şixartên vexist û di çavmiçikekê de dîmena derve wenda bû û di pencereyê re tenê tarîtiya zilmatî ya şevê diyar bû.

24

Lê pelatînkên min di qutiya xwe de li ber ronahiya zelal a lampeyê dibiriqîn. Me xwe çemand alî wan, li nîşanokên rengîn nerî û navên wan rêz kirin.

- Ev şevgorîkê zer e, min ravekir, - navê latînî fulminea ye, li van deveran kêm peyda dibe.

Heinrich Mohr bi seqbêrî pelatînkek ji qutiya wê bi bizmarên wê ve rakiribû û li binçengên wî dinerî.

- Ecêb e, wî bi kûrponijî got, - ku ti tişteke hindî pelatînkên bi jîndarî bîranînên zaroktiyê naîne bîra min.

Paşî wî pelatînk dîsan xist ciyê wê û qepaxa qutiyê girt: - De bes e lo! Wî ew bi lez û tûj got, mîna ku ev bîranîn li xweşiya wî neyên. Dema dû re min qutî birin û vegehm odeyê, ew bi rûyê xwe yê qehweyî yî teng dibişirî û cixareyek xwest.

- Aciz nebe, wî pey re got, tevî ku min li berhevoka te venekolî jî. Min bi xwe jî carekê yek wisan hebû lê mixabin min bi xwe bîranînên li ser wê lewitandin. Dikarim ji te re çîroka wê bibêjim tevî ku di rastiyê de ew mijarek şermê ye.

Wî cixareya xwe bi silala (aliyê serî yê) şûşeya lampeyê vexist, sîberdeka (abajûra) kesk dîsan xist ciyê wê û wisan bû ku rûyên me daketin nav tarîgewrikê, û ew li ber milbendê pencereyê rûnişt ku lê bejna wî ya ziraf hema qet ji derdora tarî cuda nedixwiya. Dema min cixareya xwe dikişand û qurequra beqan ji dûr di pencereya vekirî re diket hindir, dostê min ev çîroka jêrîn vegot.

Min di heşt- an nehsaliya xwe de dest bi berhevkirina pelatînkan kir û pêşî bê coşek taybet, ew jî mîna hemû yarî û mijûliyên din. Havîna  
25

duyem, dema qasî dehsalî bûm, ev berhevkirin wisan ket dilê min û ez gorî xwe kirim û giha dildariyek wisan ku pirrî caran dihat xwestin ku ew li min bê qedexekirin çimkî ji ber wê min her tiştêk din ji bîr dikir û nekirî dihişt. Dema li nêçîra pelatînkan bûm, min dengê zengilan nedibihîst, çî dema çûna dibistanê yan hatina ser sifreya xwarinê bûya, û li betlaneyan pirrî caran ji spêdeyê ta êvarê digerîm bê ku di ber re biçim malê tiştêkî bixwim. Xwarina min hemû rojê tenê pariyek nan bû. Dema pelatînkek bi taybetî bedew dibînim, hê niha jî bayek vê dildariyê min bi xwe re dibe. Di bîskekê de heyraniyek hesûdane yî bêmînak min digire ku tenê zarok dikarin hest pê bikin û ku bi hêza baskên wê

heyranîyê min dabû pey yekem pelatînka xwe. Dema pelatînkek wisan dibînim, bêhejmar bîsk û rojên zaroktiyê, êvardanên kel û gurmijîn li mêrg û çîmenên bînbiheştîn, bîskên spêdeyan ên hên li nav baxçe yan êvar li nav daristanên razdar û nepenî, ku bi xeyal û hêviyên xwe ve mîna lêgerên gencîneyan, her bîsk û gavê amade ku pêrgî bûyerên nedîtî û yên ez ne li bendê yan jî şansê xwe yê nêçîrê bêm, min xwe li ber vedina. Dema min didît ku pelatînkek bedew, a ku bila ne kêmpayda jî bûya, li ber tavê li ser gulekê dadayî û bi nefeskişandinê re baskên xwe yên rengîn jêr û jor dilivandin, û dema coşa nêçîrê kel bi ser nefesa min xistî min xwe nêztir dikir û ku min dikarî her nîşanek rengan, demarên krîstalî yên baskan û pûrtê reş î narîn ê şaxên sehekî bisihirînim, hingê min hest bi heyecan û bextiyariyê, bi pevgihanek dilşadiyek nazenîn û dildariyek fêrisane dikir ku di jiyana min a derengtir de kêmpayan bûye para min.

Çimkî dêbavên min belengaz bûm û wan nedikarî ji min re alavên taybet peyda bikin, neçar bûm ku berhevoka xwe di qutiyek kartonî ya kevn û sade de biparêzim. Min lewheyên ji binê derqefankên şûşeyan birrî bi binê wê qutiyê ve zeliqandin ji bo pêvegirêdana keleman û min gencîneya xwe di çavikên bi navdîwarên ji kartonan veçemandî berpêkirî de bi cî kir.

26

Pêşî min pirrî caran û bi şanzî berhevoka xwe nîşanî hevalan dida lê hinan ji wan sandoqên darîn ên bincam, qutiyên tirtûlan ên qumaşê dolbendî yî yê kesk niximandî û awayên din ên bedew hebûn loma min hema qet nedikarî bi alavên xwe yên nenûjen serbilindiyê bikim. Pêdivîtiyek jî tine bû ku pesnên xwe bidim û hêjatiyên xwe diyar bikim loma hîn bûm ku bidestxistiyên xwe yên herî giring û balkêş jî bi hevalan nedim zanîn û encamên nêçîran jî tenê nîşanî xwişkên xwe bidim.

Carekê min pelatînkek birqokî ji yê li cem me kê m peyda dibûn girt torra xwe û ku min ew ziwabûyî di qutiyê de bi cî kir, pozbilindiya min wisan kir ku ez xwe ranegirim loma min xwest wî hema nîşanî cîranê xwe, kurê mamoste yê li hêla din a kolanê dijiya bidim. Xerabiya wî hevalî békêmasiya wî bû, ew békêmasî ku li nik zarokan ducarî tirsnahtir e. Berhevoka wî bi xwe pirr biçûk û negiring bû lê wisan mînakane hatibû rêzkirin ku dilxweşiyek dida çavan. Wî ta hinêrek kê mpeyda û dijwar, pevzeliqandina baskên pelatînkên ên ziyarlêbûyî û şkestî jî dizanî, û bi her awayek din jî wisan kesek nimûne bû ku min bi hesûdî û nivheyranî min serê wî nediviya.

Min pelatînkê xwe yê birqokî nîşanî vî kurikê îdeal da. Wî pisporane ew nirxandin, li xwe anî ku pelatînk ji yê kê mpeyda ye û diyar kir ku bihayê wî derdorî bîst qurûşan e çimkî vî Emilî nirxê diravî yê tiştên berhevkirinê, berî her tiştî jî yê pûlên posteyî û pelatînkên, dizanî. Dû re wî dest bi rexneyan kir, got ku ew nebaş hatiye girêdan, ku çengê rastê tewîye, yê çepê hatiye veçemandin, û hê kê masiyek din jî lê dît: du piyên pelatînkê jê kê m in. Min ev kê masî wek tişteke mezin nedihesiband lê wî kêfxweşî li min herimandibû û ji hingê şûnde min êdî qet nêçîrkiriyên xwe nîşanî wî nedan.

Du salan derengtir - hingê em bûbûn xortên mezin jî, lê dîsan jî dildariya min her bihêz bû - galegotek belav bû ku Emil pelatînkê tawisrês girtiye. Wê yekê ez zêdetir coşandim ji hindê ku heke min bibihîsta ku mîrasek

27

milyonî bi hevalem min maye yan jî hevalem min pirtûkên wenda yê Livius dîtine. Kesek ji me pelatînkê tawisrês tine bû û min ew tenê ji pirtûkek kevn a pelatînkên dinasî ku nîgarên wê yê sifirî yê bidestçêkirî ji hemû wêneyên rengîn ên îroyîn bêhawe bedewtir û di

rastiyê de birêkûpêktir jî bûn. Ji hemû pelatînkên, ên ku min navên wan dizanîn û ji qutiya min kêmbûn, min ti hindî pelatînkek tawisrês bi coşî nedixwestin. Min gelek caran ji pirtûka xwe li wêneya wî nerîbû û hevaleyê min ji min re gotibû ku dema ew pelatînkê qehwerengî li ser qurmê darekê yan li ser kevirekê dadayî be û firindeyek yan dijminek din bixwaze êrişî wî bike, ew pêşbaskên xwe yê rengtarîtir ên kombûyî ji hev vedike û paşbaskên bedew û şiklên çavîn ên rengvekirî û mezin, dema xwiya dibin, wisan sosret in ku dijmin bela xwe jê vedike.

Û ev pelatînkê wiha ecêb niha bi Emilê acizker bû! Dema min ev nûçe bihîst, pêşî min hest tenê bi kêfxweşiyê kir ji ber wê yekê ku dawiya dawîn min ê ew pelatînka kêmpeyda bidîta. Min herwiha hest bi mereqdariyek bişewat kir ku biçim lê binerim. Paşî çavnebarî û hesûdiyê serê xwe hilda û bi min pirr mixabin bû ku ne kesek din lê wî nazdarokî pelatînkek wisan bihagiran û razdar bi dest xistibû. Loma min xwe ragirt û nehişt wê dilxweşiyê bikim para wî ku bibezim li pelatînka wî binerim. Lê hizir û bîrên min bi berdewamî li ser wê mijarê bûn û dotira rojê, dema galegot li dibistanê rastî derket, min biryar da ku ez ê biçim nik vî cîranê xwe.

Zû piştî firavîne min xwe lezand qata sêyem a mala vî cîranî ku kurê mamoste bi rex odayên xizmetkaran û çavikên darên bo şewitandinê ve di odeya xwe ya biçûk û ya ez pirrî caran pê çavnebar ve dijiya. Emil ne li wir bû, û ku min destikê derî bada, diyar bû ku rê vekirî ye tevî ku pirrî caran dema Emil derdiket, derî li pey xwe diqilifand.

Ketim hindir daku, qet nebe, wî pelatînkê bibînim û min zû herdu sandoqên mezin, ên ku Emil berhevoka xwe tê de diparast, derxistin.

28

Lêgerîna min bêşûde û jixwe bû ta ku ket hişê min ku divê pelatînkê hê li

ser dep û darê şidandinê be. Belê, min li wir pelatînkê tawisrês ê bi depik ve hilawîstî, baskên qehwerengî bi şelîtên zirav ên kaxezî ve rastşidandî dît. Min xwe bi ser wî de daçemand û min ji nêz ve li her dera wî, li şaxên wî yên sehekî yên qehwerengî yî vekirî yî têrpûrt, li serlêvikên baskên wî yên bedew û bêpayan rengnarîn, li pûrtika nerm a lêvikên hindirîn ên baskên jêrîn nerî. Tenê min çav nedîtin; ew bi şelîtên kaxezî hatibûn niximandin.

Bi dilek xurt lê dida, min hefsar da dest birina ji ser rêya rast ku kaxezan bidirînim û min korderzî ji depik hilkişand. Hingê min ew her çar çavên mezin î watedar, ên pirr ji nîgarên di pirtûkê de bedewtir û sosrettir dîtin, û xwestekê serjêstîn ez girtim ku divê ev pelatînkê wiha şirîn bibe yê min û, bê min hay jê bibe, bûm tawankarê yekem diziyê di jiyana xwe de, min hêdîka derzî jê hilkişand û pelatînkê ziwabûyî û yê dikarî teşeya xwe biparêze di destê min de ji odayê derketim. Tekane hest, ku hingê dilê min dagirtibû, razîbûnek bêsinor bû.

Pelatînk di destê min ê rastê de, bi pêpelûkan ve daketim. Hingê min bihîst ku kesek ji jêr ve pêrgî min tê û wijdana min hilceniqî, min zû zanî ku diz û necamêr im. Pê re jî tirsek têrxof a diyarbûna diziya min ez girtim loma min bi dozîndarî destê xwe yê pelatînk tê de xist berîka saqoyê xwe. Hêdîka meşîm û hestek cemidî ya tawanbarî û şermê bi ser laşê min de girt, bi tirsonekî di ber keçîkek xizmetkara malê, ya ku hewa diket jor, re borîm û bi dilê hilqut li ber deriyê malê rawestîm, xuhê xwe di eniya min re avêtibû der, şaş mabûm û ji xwe ditirsîm.

Di heman demê de ji min re zelal bû ku nedibû û min nedikarî jî pelatînk bi xwe bihêlim, ku diviyabû min ew vebigeranda û heke bi ti awayî gengaz bûya, min ya kirî bikira nekirî. Tevî hemû tirsê pêrgîhatina mirovan û hatingirtinê jî ez carekê bi lez li xwe zivirîm, bi pêpelûkan ve fişt bezîm jor û di deqeyekê de min dîsan xwe gihandibû odeya Emil. Bi

seqbêrî min destê xwe ji berîka xwe vekîşand û pelatînk danî ser maseyê lê hê berî bigihim lê binerim jî, min dizanî ku belayek qewimiye û kizikên girî hatin çavên min çimkî tawisrêş ruxîbû û pûç bû. Pêşbask û şaxê sehekî yê aliyê rastê jê kêş bûn, û dema min hewl da ku bi hişyarî çengê qetî ji berîka xwe derbînîn, ew hûr-hûr bûbû û bicîkirina wî êdî nedihat hesabê jî.

Tawanbarî li ber wê hestê pirr kêş e ya ku hingê ez girtibûm dema min li vî pelatînkê kêmpayda yê bedew dinerî. Min toza baskên pelatînk a qehwerengî ya hûr a bi dest û tilên min ve mayî û baskê şkestî yê li ser maseyê dîtî û min ê hema çî heyberî û kêfxweşiya xwe gorî û qurban bikira heke tenê ew dîsan wek berê saxlem bibûya.

Bi xemgînî vegeerîm malê û hemû danê êvarê li nav baxçeyê me yê biçûk rûniştîm ta ku li hengur û tarîgewrika êvarê min bisteyî da xwe ku hemû meseleyê ji diya xwe re bibêjim. Min dît ka ew çawan tirsî û xemgîn bû lê belkî ew herwiha tê gihî ku ev aşartin û îtîraf ji min re ji kişandina her celeb ceza û ezyetê diwartir bû.

- Divê tu biçî nik Emil, wê şidayî got, - û ji wî bi xwe re bibêjî. Tiştekin nikarî bikî, û ta wisan nekî, ez ê nikarim te bibexişînim. Jê re bibêje ku ew dikare tiştekin te li şûna wê ji xwe re bibijêre û divê ji wî lêborînê bixwazî.

Heke ne ev kurik bûya, kî din bûya, dê ji min re asantir bûya. Min hê bi pêşînkî fam kir ku ew ê di min negiha, belkî dê ti caran bawer jî nekira, û bû êvar û hema bû şev jî bê ku bikarim zorê bidim xwe biçim cem Emil. Paşî diya min ez li ber derî dîtî û hêdîka got: - Divê îro wisan bikî, de here!

Wiha çûm mala Emil û min li qata jêrîn li wî pirsî, ew hat û zû got ku

yekî - kesek bîje yan belkî firindeyekî yan pisîkekê - tawisrêse wî pûç  
30

kiriye, û min daxwaz kir ku ew min bibe odeya xwe û nîşanî min bide. Em hewa ketim silal, wî deriyê odeya xwe vekir û şemalek hil kir û min pelatînkê tewizandî li ser depikê veşidandinê dît. Diyar bû ew tê koşîbû ku ziyanan bicebirîne, çengê şkestî bi hişyarî li ser kaxezek şil hatibû pankirin lê sererastkirin negengaz bû û di ser re jî yek ji herdu şaxên sehekî kê m bû.

Hingê min beyan kir ku ez im ê gunekar, tê koşîm meseleyê ravebikim û şîrove bikim.

Emil ne qehirî û ne jî qîrî, tenê di nav didanên xwe re fîtî û firîzî, bîskekê bi bêdengî li min nerî û paşî got:

- De baş e, tu hevaley wiha bûyî, ha, de baş e.

Min xwest hemû pêlîstokên xwe bidimê, û ku wî xwe xwînsar ragirt û her bi nirxnizmî li min nerî, min soz da ku hemû berhevoka xwe ya pelatînkên bidimê. Lê wî got:

- Hema li te pêroz be; ma ez berhevoka te nanasim. Ev jî dîsan nîşaneyek baş bû ji hindê ka tu çawan matî ji pelatînkên dikî.

Hingê kê mabû ku min ê xwe biavêta hefika wî û ew bifetisanda. Ti tişte jî dest min nedihat, ez bêwec bûm û her wisan mam lê Emil xwînsar û rêrast mîna sazûmana gerdûnî bi xwe bû. Wî hema ez lome jî nekirim, tenê carinan bi kubarî berê xwe dida min.

Hingê min yekem car dît ku mirov nikare tiştê pûçkirî durist bike. Çûm malê û kêfxweş bûm ku diya min tişte jî min nepirsî, tenê ez maç kirim û bela xwe ji min vekir. Diviyabû biçim rabikevim, ji min re êdî dereng bû. Lê ji berî hindê bi dizîkî û nepenî çûm odeya xwaringeh û min qutiyek qehwerengî ya mezin anî, danî ser doşeka xwe û di tarîtiyê de ew vekir.



Pey re min yek bi yek pelatînkên xwe jê derxistin û ew bi tiliyên xwe meriçandin û zirviçandin û kirin toz û qerpal.

Aliyê dî

Maureen Manuel

David Morgan di xew de xwe vediqulipand. Xuh ji eniya wî dadirijî û çarçev ji lept û livên wî yên gevizok qurmiçîbûn. Hemşîreyê gazî kir doktor yê ku ji daîreya nêz lezî odeya taybet.

- Kengî? wî pirsî.

- Berî pênc deqeyan dest pê kir, hemşîreyê bersivand. - Pêşî livên wî tena û hêdîk bûn. Lê ev deqeyek e ew xirabtir bûne.

Doktorî Morgan vehejand û bi navê wî bang kirê. Bêsûde bû. Wî mêrik dîsan vehejand û paşî hin ava sar avêt rûyê wî. Hêdî-hêdî mêrikê nivistî vehewiya û paşî, pirr hêdîka, çavên xwe vekirin.

- Her car dirêjtir dem vedikêşe, doktor minminî. Wî ji hemşîreyê re got:

- Li nik wî bimîne. Ew dê dîsan bikeve xewa normal.

Doktor vegerrî daîreya xwe û nesaxnameya Morgan derxist: David Morgan, jî 35, pîşe mamoste, bêjin, nînin nesaxiyên cidî. Van salên

32

dawîn xewnên kabûs bela xwe li wî dabû û tenduristiya wî ya derûnî ji reh û rîş ve dihejand. Azmûn û ceribandînen psîkyatrîk ti çare jê re neanîbûn. Çar hefte berê spêdeyekê hatibû dîtin ku Morgan li gor serê xwe li kuçe û kolanan digerre. Ew di rewşek derûnî ya tevlihev de bû. Ji hingê ve ew li nesaxaneyê dihat çarekirin. Doktor dosyeya wî deyna der. Tek tiştê wî dizanî ew bû ku şiyarbûna ji kabûsan her car ji berê diwartir bû. Cîhana xewnan dikoşî zora rastîniyê bibe.

Hê jî tarî bû dema David Morgan şiyar bû. Hemşîre li ber maseyê rûniştibû û bîrnot li ber ronahiya kiz ya lampeya maseyê dinivîsîn. Mêrik bêdeng paldayî bû bêyî ku bixwaze dên û bala hemşîreyê bikêşe ser xwe. Ew li xewna xwe dipûnijî.

Xewn her car eynî bû. Ew li gel komek mirovan dipeyivî. Mirovan li ser baştirîn cezayê gengaz suhbet dikir. Wî pêşniya dikir ku baştirîn ceza ew e ku tawanbar bêt zindankirin di hicreyek bêderî û bêpencere ve, bêyî ti tiştê hebe bike, bêyî ji borîna demê agadar bibe. Ew cezayek ji mirinê baştir e.

Wî xwe di hicreyek wisan ve didît. Ew dikoşî libinên dîwar bikirîne daku bikare jê derkeve. Wa dixwiya ku dîwar bi ser wî de dihatin. Dîwaran hewl dida wî bifetisînin. Di wê delîvê re ew hertim şiyar dibû. Wî dizanî ku tek rêya ew bikare ji wê xewnê bifilite û xilas bibe ew bû ku dîwarî bipeqîne. Di her xewnê de wî tîkek mezintir li dîwarê ji libanan çêdikir û vê carê ew dê tê re derketiba eger doktor ew ji xewê şiyar nekiriba. Ew koşîbû vê nerîna xwe şirove bike lê her kesî bawer dikir ku ew ji ber xwe diaxive. Wan digot ku xewn zêde dilê wî ditehibînin lew li demên ew di xew de çavdêriya wî dihat kirin. Lê mêrik hêvî dikir ku carekê bikare bi rehetî ta dawiya xewnê binive.

33

Wê êvarê du trênen lezgîn li hev qelibîn. Nexweşxane ji goriyên wê qezayê

mişt û tijî bû. David Morgan tam hatibû şiyarkirin dema desteyê yekem ji birîndaran giha wir. Çiku wa diyar bû ku ew li ber bû bikeve xewek normal, hemşîreyê bawer kir dikare wî kêlîkekê bi tenê bihêle. Û eger bi hişmendî lê bêt nerîn, ma çi ne xewnên xirab li ber birînen xedar yên bedenî?

David zû di xew çû û taviî di hicreya xwe ve bû. Wî hemû cebl ji dor libinan raçirrandibû û dîwar êdî xwe ranegirt. Ew bi xurtî xebitî ta ku kunek mirov tê re biçê lê kir. Bi dijarî wî xwe gihand aliyê dî yê dîwar.

Li wir hicreyek hebû, tam wek ya berê!

Ew bêhêvî şewişî û ket erdê. Ti çareyek dî nebû ji bilî hindê ku bisekine ta bê şiyarkirin. Piştî bîskeke hat guhê wî ku bi navê wî hawar dîkinê.

Ew rabû ser xwe, bendewar bû ku dawî li xewa wî bê û kesên nexweşxaneyê yê nas li kêleka wî bin. Lê wa neqewimî. Wî dîsan deng bîstin lê qelstir. Ji nişkê tê derxist ku ew di hicreyek dî ve ye! Ew herdem li hicreya xwe hatibû şiyarkirin lew kesî nedizanî ku ew li vê hicreyê ye daku li pey wî bîn. Wî xwe di kunikê re avêt hicreya dî. Lê li wir tenê bêdengî hebû.

Li odeyek nexweşxaneyê doktor çarçev vekişand ser çavên David Morgan.

- Dilê wî xwe êdî hew ragirt, wî got.

- Dibe ew niha bikare bizane ka çî li aliyê dî yê hicreyê heye.

Wergerandin: 10/2003

34

Rojavabûn (\*)

Mehabad Qeredaxî

Diyarî canên pelatînkane yê zarrokên enfalkirî, yê wan pelatînkane yê me nedizanî ka kîjan mêrg kiriye biheşt ta ku taliyê li roja zarroyên cîhanê

- 1.6.2003 - ji dojeha çalgorrên enfalkiriyên serik û hestîkên wan yê nazik û narîn li gel pêlîstok û yarîkên wan hatin dîtin... Bo canê wan yê ji

bîra min naçin diyarî ye ev çîrrok û her bîr û tîrê ji qelema min biçê. (\*\*)

Dixwaze mirinê bibîne lê dîmenê rojavabûnê nebîne. Dema rengê narincî

yê avabûna rojê dibîne, hindî jê bêt dike hawar û qîrrîn ta biweste û gêj bibe. Êvaran dibin hindirr daku rojavabûnê nebîne. Lê nebîne jî, hest pê dike. Hawar dike, hawarek wa ku pencere û dîwarên odeyê vedilerizîne. Dorberên xwe çol dike; pirr car xwe rahiştiye kêrê û dixwaze xwe bikuje û

aram bibe. Cigare jî lê hatine qedexekirin; çendîn car cigare bi leşê xwe venaye taku temiriye: bi her awa xwe jan dide daku fikr û endîşeyên xwe kêr bike. Ku cigare bi leşê xwe vedina, hestek tijî aramî û asûdeyî ew digirt û rûyê wî vedigeşî.

35

Demek e neynik û awêne nedîtine. Nizane ew sîmayê esmerî delal, ku berê miştî şadî û hêwirî bû, niha reş dagerrîye û çendîn xetik û xîçikan li eniya wî nexşeya pîriyek nedem nîgarandiye. Salek e li ber ti neynik û camên pencereyan rastî dêm û dîmenê xwe nebûye. Awêne lê hatine veşartin; pêşî dijminî bi awênayan re hebû. Dema westayî vegerrî, Wefayê

wek her car bi rûgeşî ew hemêzand lê ew - mîna ku her ne li vê dinyayê be - bêyî peyvek ji devî derbikeve ket odeyê. Wefa ji westîn, nerehetî û xerîbiya wî haydar bû lê nedizanî ka çi qewimiye, çima rengê xwe avêtiye. Xwest wî dilşad bike bi wê mizgîna xêrê ya ew çar sal li bendê bûn:

- Mizgîn, me zarrokek bûye!

Vê nûçeyê ne tenê ew dilxweş nekir lê hê pirrtir eniya wî şidand. Bêyî qet gotinekê bike çû odeya nivistinê û xwe pal da. Çi belayê ev peya guherrandiye? Wefa ket şikan ji wê bédengiya sosret. Her dinijinand û diherrifand lê ti bersiv peyda nedikir.

Wî li binbanî dinerî û her dipûnijî mîna ku rûberî binbanî destanan bixwîne. Belkî li hemû jiyana xwe ya raborî pûnijîbe, li xortaniya xwe,

belkî ta li yekem cotê pêlavên xwe yên bavo bi boneya çûna dibistanê jê re kirrîbûn. Soz dabûyê, ger ew biçê dibistanê, cotek solên sor bo bistîne. Bi şev, dema diçû binive, li hindê diramî ka dê kengî mezin bibe û jiyê wî bibe şeş sal û biçê dibistanê. Hind dibistan û pêlav di serî de bûn ku bawer dikir herdu peyv her hev wate ne. Dibistan û pêlav mijarên fikirîn û

devikên xeyalên wî bûn. Sê sal hiş û bîrên wî li ser dibistanê û pêlavê bûn. Diçû kêleka diya xwe û dipirsî:

- Ez ê kengî biçim dibistanê?
- Dema didanên te yên şîrî bikevin, dê biçî dibistanê.
- Kengî didanên min yên şîrî dê bikevin?

36

- Dema bibî şeşsalî.

Bi tilên xwe yên hûrik didanên xwe yên pêşîn zêft dikirin û bi tundî dileqandin daku bi pêşdemî bikevin. Carekê bo xatirê pêlavan kevir li didanek xwe da daku leqok bibe û bikeve. Dixwest xap û lêban li temenê xwe bike daku herî zû bigihe şeşsalîyê. Didanên wî ketin lê hê jî bo şabûna bi pêlav û dibistanê dem mabû.

- Dayê can, va ye didanên min yên pêşîn ketine.
- Qurban, hê salek te bo dibistanê maye.

Xewn didîtin ku diçe dibistanek sor ya bi dirûvê pêlavê. Li serbanê dibistanê jî alaya welat dipêle. Werîsek sor yê zirav bi stûnê ve ye, werîs jî

ji qeytana pêlavê diçe!

Bû şeşsalî, pêlava sor kir piyên xwe û çû dibistanê. Ji xweşiya pêlavê ji dibistanê jî pirr hez kir û çî ji devê mamosteyan derketiba, wî ji ber dikir. Birêveberê dibistanê her sal diyariyek didayê lê ti diyariyê bi qasî wê sola

sor ew dilxweş nedikir, ta wê rojê jî ya taximek li xwe kir û yekem stubenda xwe kir stuyê xwe da biçe xwendengeha bilind.

- Kurrê min, bi gotina min bike, herre fêrgeha leşkerî.

- Bavo can, heza min li hîngeha endazyarî ye.

- Kurrê min, îro nan tenê di leşkeriyê de ye. Va ye sedan endazyar bêkar mane û paletî jî bi dest nakeve. Bi hezar sergêjiyan min tu dayî perwerdekirin. Niha pîr bûme û min şiyana karkirinê nemaye. Bi gotina min bike, bila tu jî betal nemîn!

Çû fêrgeha leşkerî. Bavê wî rûgeş dibû bi dîtina bejna bilind ya kurrê xwe, bi cilên wî yên leşkerî yên havînan bergspî û zivistanan bergşîn û şewqeyê wî yê pîr lê dihat! Tevî ku serê wî hatibû tiraşîn jî, sîmayê wî

37

her balkêş bû. Her bi wan cilan dên û bala Wefayê jî kişandibû. Dema hevdu nasî û li kinar Dicle raz û niyazên xwe pev guherrandin, pîr ji hev hez kir. Evînek mezin herdu girtin. Li gel Wefayê zewicî û çar sal bû bi hev re dijiyan. Heyamek bû wan bêriya zarroyekî dikir ku jiyana wan rontir bike lê dema bû bav, êdî nedizanî ka bavînî çi ye!

- Welîd can, bêje, çi qewimiye! Çi tu nerehet kiriyî ku dilê te bi savakê me xweş nabe?! Binere, çendî spehî ye, tam bi te ve çûye.

Qey çavên wî ranebin li zarrokî binere, çavên xwe dineqandin û xwe dixwar. Ta êvarê bêdeng bû, bêyî ji ciyê xwe bilive paldayî bû. Dema rojavabûnê dîmenê xwe yê narincî di pencereyê re diyar kir, rabû piyan, hawar kir, hawarek bilind, pîr bilind. Xwe di neynika mezin re dît, mistek lê da û hûr-hûr kir û xwîn bi dest û tilan de hat. Dema xwîna destê xwe bînî û hest bi jana birînên dest û lepên xwe kir, henaseyek aramiyê hilkişand û li erdê di xew çû.

Wefa heyirîbû, nedizanî çima wa qewimî. Ev akar û reftar li bal wê pîr

neasayî bû. Pehitî. Lê piştî her rojavabûnê dubare û sêbare û dehbare wa qewimî û hawar û nalîna Welîd hat bîstin. Ya ji wê hat tenê ew bû ku dixwest bizane ka sedema vê guherrîn û nearamiya Welîd çi ye!

Salek e li vê odeya vê nexweşxaneyê taybet li ber çavdêriya bijîşkan e. Li ber her rojavabûnê jî dibe volkan û hilditeqe. Demên din jî ne asayî ye lê rojavabûn canê wî dide ber şûjînan. Dibê bombeyek e û di bedena wî de diteqe. Naxwaze çavê wî ta bi tekane zarrokê wî jî bikeve, nemaze li dema rojavabûnê. Sola sor û mezin wî dîn û har dike: her ku pêlava sore mezin dibîne, giş canê wî wek agir germ dibe û wî tûşî hîsteryayek tund dike û ew dike hawar û sedhawar ta gêj dibe û dikeve!

Wefa matmayî dibe ji wê belayê! Wê pirr car bîstiyê ku wî wek bîranînek xweş basa cotê pêlavên xwe yên sor yên zarrokiyê kiriye. Wî digot: "Tevî 38

ku pirr dirêj vekêşa ta bûm xwediye wî cotê pêlavan lê dîsan jî ew yadgarek şîrîn ya serdema zarrokiya min e." Her ku ew bîranîn vedigot, bi beşoşî digot: "Niha jî ji pêlava sor hez dikim, her dîsan jî dîmenê pêlavên sor min dîn û har dike." Matmana wî her zêdetir dibû dema didît ew savayê ku ew bendewarî bû û hê ji yekem roja zemawenda xwe navê wî plan kiribû Xalid eger kurr be yan Heyfa eger keç be. Dema niha Xalidî dibîne, dibizde mîna ku sawirên mirinê bibîne. Xwedêyo, ev çi ye qewimiye?! Berê dema vedigerrî, diyariyek nedîtî delal bo Wefayê dianî û

demek dirêj her dera wê dimaçand û digotê: "Hevsera min ya wefadar." Guhê xwe dida bi zikê wê re û digotê: "Savakê me dê kengî bê?" Lê niha awirekê jî nedide wê û ne jî yê sava! Ta ger bangî jî bêt kirin, bersivê nade mîna navê xwe ji bîr kiribe yan nexwaze guh li wî navî bibe. Berê çi gava Wefayê gazî kiribayê, wî digot: "Bi dengê te navê min pirr xweş e.

Dema bangî min dikî, hest pê dikim ku min xweştirîn nav heye!"  
Bi hemû wan xet û xîçên kurt û dirêj li devûlêv û serûçavan kî bawer dike ku tenê sî-û-pêncsalî ye?! Yê niha bibîne, dê bawer bike ku ducarî wî temenî ye. Yê li wêneyên wî yên dema şagirtiyê û leşkeriyê hûr binere, dê şik bike ku ew be: Hingê bedenek xurt û milpan, bejnek bilind, du çavên gir û geş, kenek jidil balkêş... Niha dibê qey hatiye hêrandin! Hez dike mirinê bibîne lê rojavabûnê nebîne. Stêran dinya lê tal kiriye, wan stêran yên ew kiriye delodînek ku niha nojdar jî ji halê wî heyirî dimînin. Wan stêran wa kir ku kerb û kîna wî bigihe kurrê wî yê sava jî û dîmenê rojavabûnê lê bibe dojah û pêlavên sor wî har û dîn bikin. Wan stêran wa kir ku bikerb bibe ji çirisîna stêran û ta ji navê xwe jî! Dixwaze guh li mirinê bibe lê li navê bavê xwe nebe. Ta pirrtir ji navê xwe, kîna wî li yê bavê wî ye - wî bavî yê du kitî rojan xuha xwe li ber tavê darijand daku jê re bide bi cotek solên sor - ma kî hebû ji wî kurrî pêve! Heft keç li ber wan wek pûşê li ber ba bûn! Encax piştî jidayikbûna wî wan hest bi hebûna piştevaniyekê kir. Wan dixwest bi ti awayî dilê wî

39

neêşînin lê nedariyê rê nedida her tiştî bo bikirrin. Her ew destkurtî bû ya bû sedema hindê ku bavê wî bixwaze ew bibe efser. Çi rojek tirsnak bû ji serdema xortaniyê, çî belayek bû ku bêyî vîna xwe bû efser! Wa ji her tiştî mat mabû! Baş li bîra wê ye ew cara vegerrî û destê xwe li stuyî aland û bi kenek tîqtîqî got:  
- Min stêrek din jî wergirt.  
Digot: "Divê spasiya bavê xwe bikim ku pêşniya kir biçim fêrgeha leşkerî."  
Heman rojê destek gulan bir ser gorra bavê xwe.  
Ji pîşeyê xwe pirr hez dikir, belkî ji wê rêzdariya bêpayan bû ya bindarên



wî û xelkê didayê. Carinan şik dibir ji wê rêzdariya bêmimûne, guman dikir û di dilê xwe de digot: Gelo ev ya xelk dike ji rêzdariya yan jî ji tirsî ji min e, ji tirsî ji efserekî? Lê taliyê baweriya wî xurt bû ku pîşeya wî giring e û hejî rêzdarîyê ye.

Li leşkergeha xwe li hemû rojavabûnan li dîmenê narincîbûna rojê dipûnîjî ta ku roj bi tevavî ava dibû. Wa hişên wî diçûn bal Wefayê ya ku ji ber dûrî û kar mehê tenê carekê lê vedigerrî û hefteyek li hemêza wê diborand. Evîna xwe ya li dema rojavabûnê li kinarî Dicle bi bîr dianî dema herduyan bi pistînan danûstan dikir. Dîmenê narincî yê rojê ew nazik û narîn dikirin û destên wan di hev de bûn û ta roj ava dibû çavên wan li hev vediman û bedenên wan dibûn heman parçe dildarî. Wa diman ta roj ava dibû û wan Dicle bi cî dihêla û her yek ber bi mala xwe vedigerrî lê bi şev jî her xewn bi hev û bîskên tijî hezkirin yê rojavabûnê ve didîtin...

Niha hez dike mirinê bibîne lê dîmenê rojavabûnê nebîne. Dîsan êvar e, kêlîka avabûna rojê teqînek di hindirrî de hildibe! Yekcar lawaz bûye, 40

maye tenê hestî û çermikek çirr û qaştîk. Rûyê wî tirsnak dixwiye, dibê qey mirî ye û ji bin axê derketiye. Rojavabûn jê re ne zeman e lê volkan e û di wijdana wî de diteqe û her roj komek ji hicreyên mejiyê wî dişewitîne. Dema rojavabûnê roj lê dibe gorristan û bedena wî jî dibe gorrek kûr û teng bo canê wî!

Tenê çend lib hicreyên sax di mejî de mane. Dilê wî sist bûye û tenê têra teqînek din ya volkanî dike. Dîsan êvar e. Dîsan hat ber çavan, ber wan çavan yê êdî têra tenê dîtinek dî ya wî dîmenê tirsnak dikin.

Li odeya xwe rûniştî bû, eskerek hat hindirr, silavek eskerî dayê, lîsteyek da dest û dubare silavek dayê û derket. Li lîsteyê sedan nav hebûn. Ji

odeya xwe derket û dîtin sê otobusên dirêj yên rawestî û komek xelkê:  
jin

û mêr, zarr û zêç, genc û pîr. Hemûyan serê xwe wa berjêr kiribû ku dibê  
qey ti car wan serê xwe ranekiriye... Ma ne dibe ev lîste şaşiyek be?! Nav  
yek bi yek xwendin, û yên navên wan xwendiban, diviya bibêjin: Belê.  
Giha navê Şaxewan, Ti kesî bersiv neda. Pirsî: - Şaxewan kî ye? Çima  
bersivê nade?

Dayikekê dergûşanek raber kir. Nê ev zarrokê sava hê ji çilikên xwe  
derbas nebûye! Seyr û sosret e! Hebe-nebe ev lîste xelet e!

Çû nik rayid Elî, silavek leşkerî dayê û lîste da dest:

- Mezinê'm, wa diyar e ev lîste şaş e!

Elî lê nerî û eniya xwe kir girêk. Bazên sermilkên wî bi livîna kelexê wî yê  
gembolan re dibiriqîn mîna ku bixwazin serî lê bixwin!

- Çima diyar e ku şaş e?

- Mezinê'm, zarrokek sava tê de ye, tenê yekmehî ye!

41

- Vêca ma ew jî şaşî ye!?

- Mezinê'm, lê...

- Aniha fermanê bi cî bîne!

Derket. Elî rawestî û destên xwe danîn ser kemerê û piyên xwe ji hev  
belav kirin. Bazên ser milî dibiriqîn, dibê qey devên xwe beş kirine û  
dixwazin serî lê bixwin, pencirrkên wan li ber bûn çavan jê bîqoqilînin.  
Xelk kirin rêz. Şaxewan di hemêza diya xwe de bû, bi sînga xwe ve  
şidandibû. Dayikê serê xwe şorr kiribû ser, wek bipiste guhî: - Ruha'm,  
çima hatî vê dinyaya kembax?!

Şaxewan girî. Elî destên xwe li hewa şepandin. Ku Şaxewan dest bi girîne  
kir, Elî jî jest û hêma da leşkerên xwe. Hawara hemûyan bilind bû û

kêlîkekê xayand lê paşî veçopirî û tenê qorreqorra pêt ya Şaxewan dihat bîstin - mîna ku ji dêlva tevan biqîrre. Elî hêma da Welîd ku Welîd pênekê lê bide û dengê wî vebibirre. Şaxewan mîna çûçelokek çivîkan yê bêperr û bêbask bû. Kiraskek spî lê bû, spî wek rengê kefen. Welîd çirkeyekê rawestî û li Elî nerî. Çavên Elî zîq û biloq bûn û agir jê hildibarî, bazên ser milî dibiriqîn û dest li ser demanceyê bû. Hicreyên mejiyê Welîd di bîskekê de ketin lebitînek lezgîn. Kêlîka piyê xwe rakir ta giha ser zikê yê sava, li sermilkên xwe nerî: stêrên li ser milî diçirisîn; dê stêrek dî wergirtiba û bûba balyoz. Berê xwe da asoyê: dîmenê narincî yê rojavabûnê dît, mîna tabût be û wijdana wî tê de be... Berê xwe dagerrand: postala wî ya mezin di zikê yê sava re çûbû! Piyê xwe hilda, postala wî sor bûbû! Dawî li dengê Şaxewan hat! Li Elî nerî: bo li çepikan dida. Stêrek din jî li ser milî ket zîqzîqanê. Bazekî jî devê wî daxist! Roja din, eynî dem, ji odeya xwe derket. Çal hatibûn dagirtin. Serê xwe hilda. Dema dîmenê narincî yê rojavabûnê dît, volkanek di derûnê de hilteqî! Volkan bû yan jî qarrewarra Şaxewan? Qîjîna Şaxewan bû yan jî 42

teqîna wijdanê?! Herdu çavên xwe miçandin daku rojavabûnê nebîne. Kir hawar, hawara xwe bilind kir ta ku gêj bû û ket!  
Bênvedan bo hat nivîsîn lê qet ti car rehet nebû! Her êvar ew dengê Şaxewan wek volkan di dilî de diteqe. Hez dike mirinê bibîne lê rojavabûnê qet nebîne!

---

Zivistana 1993  
Skinnskatteberg  
Swêd  
Ji soranî: 9/2003

---

\* Ev çîrrok 1993 hatiye nivîsîn û 1994 di pirtûka Koç ya nivîskarê de çap û belav bûye. 9/2003 ew bo "Antolojiya Çîrokên Kurdî" (amadekar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem) ji soranî hatiye kurmancîkirin.

\*\* Ev pêşgotin di çapa soranî de nîne, MQ ew bo wergerra kurmancî nivîsiye.

43

Bilbil û sorgul

Oscar Wilde (1854 - 1900)

'Wê got dê li gel min bireqise ger ez jê re gulên sor bînim', şagirtê xort got,

'lê li hemû gulistana min gulek sor nîne'.

Ji hêlîna xwe ya li ser dara gûzê bilbil dengê wî bîst, û di nav pelan re li derê nerî û pûnijî.

'Nîne ti gulek sor li hemû gulistana min!' yê şagirt got, û çavên wî yên spehî tijî rondik bûn. 'Ax, ji tiştên çend biçûk e dilşadî! Min xwendiyê hemû hişmendiya mirovan nivîsî, û hemû nehîniyên felsefeyê yên min in lê ji ber daxwaza gulek sor jiyana min bûye kembaxî.'

'Taliyê ev e evîndarek rast', bilbil got. 'Her şev ez li ser wî strîme tevî ku min ew nenasiye jî; her şev min çîroka wî ji stêran re vegotiyê û niha wî dibînim. Pirça wî reş e wek gula simbil, û lêvên wî sor in wek sorgula daxwaza wî; lê dildariyê rûyê wî mîna qerenfîl zerik û spîçolkî kiriye, û xemgîniyê mora xwe li eniya wî daniye.'

'Mîr dê sibe şehyanekê li dar bixe', şagirtê xort minminî, 'û dildara min dê di nav de be. Ger ez gulek sor ji wê re bînim, ew dê ta elindê bi min re bireqise. Ger ez gulek sor jê re bînim, ew dê di zendên min de be, û ew dê

serê xwe pal bide ber milê, û destê wê dê di yê min de be. Lê ti gulên sor li gulistana min nînin lew divê ez bi tenê rûnim, û ew dê di ber min re bibore. Ew dê ti pûte bi min neke, û dilê min dê bişkê.'

'Ev e, bi rastî, evîndarek ji dil', bilbil got. 'Tiştê ez distrim, ew jê dinale; ya bo min şadî ye, bo wî jan e. Bêguman evîn tiştê ecêb e. Ew ji zimrûdan binirxtir e, ji opalan delaltir e. Hirmî û hinar ne hêjayî wê ne û ne jî ew li bazaran tê firotin. Ew ne ji bazirganan tê kîrîn û ne jî li ber zêrr tê kêşan.'

'Muzîkjen dê li dîwana xwe rûnin', şagirtê xort got, 'û tîlên amûrên xwe bijênînin, û dildara min dê li ber awazên çeng û kemanê bidanse. Ew dê wa sivik bireqise ku piyên wê dê ji erdê negirin, û dîwanî dê bi cil û bergên xwe yê xweşik li dor wê bigerrin. Lê bi min re ew dê nedanse çiku min ti gulek sor nîne bidimê'; û wî xwe avêt nav giyayî, rûyê xwe di nav destên xwe de veşart û girî.

'Ew çima digirî?' margîsokek keskî biçûk pirsî dema kilik li hewa di ber re borî.

'Bi rastî, bo çi!' got pelatînekê yê li pey tîrojêkê dipirpirî.

'Bi rastî, bo çi?' pistî beybûnek guhê cîrana xwe, bi dengê nerm û nizm.

'Ew bo gulek sor digirî', bilbil got.

'Bo gulek sor?' ew qîrîn; 'çi kenokane ye!' margîsok, yê ku hinekî reşbîn bû, rasterast kenî.

Lê bilbil di nehîniya xemgîniya şagirtê xort giha û bêdeng li ser darê nişt û li efsûniya evîne pûnijî.

Tavilê wî çengên xwe bo firrîne belav kirin û hilket hewa. Ew wek siyekê di nav daristanokê re borî û wek siyekê di gulistanê re seyirî.

Li nêveka zeviya giyayî deviyek delal ya sorgulan hebû, û dema bilbil ew dît, firriyê û dada ser çeqek wê.

'Gulek sor bide min', bilbil got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand. 'Gulên min spî ne', wê bersivand; 'spî şibî kefa deryayan û spîtir ji berfa gupika çiyayan. Lê herre nik xwişka min ya li ber rojenga kevn, belkî ew ya dixwazî bide te.'

Wa bilbil firrî ser dara li ber rojenga kevn.

'Gulek sor bide min', wî got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand. 'Gulên min zer in', wê bersiv da; 'zer hindî pirça keça avîn ya li ser kursiyek karîbanî rûniştî û zertir ji nêrgizên li mêrgan dipişkivin ji berî dirûvan bi tirpanan dikevin nav. Lê herre cem xwişka min ya li ber pencereya yê şagirt, belkî ew ya dixwazî bide te.'

Wa bilbil firrî ser dara sorgulan ya li ber pencereya yê şagirt.

'Gulek sor bide min', wî got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand.

'Gulên min sor in', wê bersivand, 'sor wek piyên kevokan, sortir ji morîk û mircanên gir yên di şkeftên okyanûsan ve her dipêlin. Lê zivistanê sirr û sar kirine demarên min û seqemê bişkojên min piçandine û bahozê çeqên min şkandine û îsal min qet ti gul nabin.'

'Ez tenê gulek sor dixwazim,' bilbil girî, 'tenê gulek sor! Ma ti rê nînin ku wê peyda bikim?'

'Rêyek heye', darê bersiv da; 'lê wa xirab e ku newêrim bibêjim te.'

46

'Wê ji min re bibêje', bilbil got, 'ez natirsim.'

'Ger gulek sor bixwazî', darê gotê, 'divê tu wê li ber tavheyvê ji muzîkê

çêbikî û bi xwîna dilê xwe birengînî. Divê dilê xwe bidî ber striyekî û ji min re bistrî. Divê hemû şevê bo min bistrî, û divê strî dilê te biperritîne, û divê xwîna canê te biherrike demarên min û bibe ya min.'

'Mirin bihayek giran e bo gulek sor, bilbil got, 'û jiyana bo her yekî şirîn e. Dilşadî ye rûniştina li ser darên kesk û nerîna li rojê di erebaneya wê ya zêrrîn de û li heyvê di erebaneya wê ya morîkî de. Şirîn e bêna dargiwîjê û şirîn in gulberfînên xwe li geliyana vedişêrin û gulgêzikên li girik û zûrikan vedifirrin. Lê hê jî evîn xweştir e ji jiyane, û ma çî ye dilê firrindayan li ber yê mirovan?'

Wa wî çengên xwe yên gewr bo firrê vekirin û hilket hewa. Ew wek siyekê di nav daristanokê re pirrî û wek siyekê di gulistanê re seyirî.

Şagirtê xort hê jî li nav giya paldayî bû, li ciyê bilbil ew vehêlabû, û rondik hê jî ji çavên wî yên spehî zihî nebûbûn.

'Kêfxweş be', bilbil gotê, 'dilxweş be; gula te ya sor dê peyda bibe. Ez dê wê ji muzîka xwe li ber tavheyvê şên bikim û bi xwîna dilê xwe birengînim. Ya min wek berdel ji te divê tenê ew e ku tu evîndarek ji dil bî çiku Evîn hişmendtir e ji Felsefeyê tevî ku ev hişmend e jî, û xurttir e ji Hêzê tevî ku ev xurt e jî. Reng-agir in çengê wê û ji rengê agir e bedena wê. Lêvên wê şirîn in wek hingiv û hilma wê wek gulan.'

Yê şagirt ji erdê li bilbil guhdarî dikir lê tê nedigihî ka bilbil çî dibêje çiku wî tenê ew dizanî ya di pirtûkan de hatiye nivîsîn.

Lê dargûz tê gihî û pirr xemgîn bû çiku gelek hez dikir ji bilbilê biçûk yê hêlîna xwe li ser çeqên wê çêkiribû.

47

'Hê stranekê ji min re bistre', dargûz pistî, 'ez dê pirr hest bi tenêtiyê bikim piştî nemana te.'

Wa strî bilbil ji dargûzê re û dengê wî wek avê bû ya ji amanek zîvîn

dibilqe.

Dema bilbil strana xwe xilas kir, yê şagirt rabû ser xwe û lênivîskek û pênivîskek ji berîka xwe deranîn.

'Ew şeng e', wî got dema di nav daristanokê re meşî - 'ew yek nikare jê bêt mandelkirin lê ma hest hene? Mixabin na. Bi rastî, ew mîna pîrraniya hunermendan e: ew hemû stîl e bê dilpakî. Ew xwe gorî yên dî nake. Ew tenê li muzîkê dirame, û her yek dizane ku huner xweperestî ne. Dîsan jî, divê bêt dirkandin ku xwedî dengê delal e. Mixabin ti wateya wan dengan nîne yan jî kêrî tiştekî nayên.' Û ew çû odeya xwe û xwe dirêj kir ser doşekoka xwe ya ji kayê û dest bi pûnijîna li ser evîna xwe kir; û, piştî demekê, di xew çû.

Û dema heyvê şewqa xwe da, bilbil firrî ser dara sorgulan û sînga xwe da ber striyekî. Bi dirêjiya hemû şevê ew strî, sînga wî bi strî ve, û heyva belûrî sar daşorrî û guh dayê. Bi dirêjiya hemû şevê bilbil strî, û strî kûrtir û kûrtir di sînga wî daçû û xwîna canê wî jê darijî.

Bilbil pêşî strî li ser welidîna evînê di dilê keçekê û yê kurrekî de. Û bi gupika çeqê jorîn yê dara sorgulan ve gulek sosret pel bi pel dest bi pişkivînê kir dema stranek li pey ya dî hat xwendin. Sîs bû pêşî wek mija li hindavî çem - boz bû wek piyên spêdeyê û zîvîn bû wek çeng û baskên elindê. Wek siya gulekê di neynikekê re, wek sîbera gulekê di gerravekê de, wa bû gula dibişkivî bi gupika çeqê jorîn yê darê ve.

Lê darê bang kir bilbil daku hê pêttir xwe bi strî ve bişidîne. 'Xwe pê ve bişidîne, bilbiloko', dar qîrrî, 'yan roj dê derbikeve ji berî sorgul bigihe.'

48

Wa bilbil sînga xwe xurttir bi strî ve şidand û dengê strana xwe her bilindtir kir çiku ew distrî li ser welidîna dildariyê di canê kurrekî û yê keçekê de.



Û regek delal yê sorî vebûyî xwe da pelên gulê, regek wek yê li rûyê zava dema ew bûkê dimaçîne. Lê strî hê negihabû dilê wî lew dilê gulê hê spî mabû çiku tenê xwîna dilê bilbil dikare dilê gulê sor bike.

Û darê gazî bilbil kir daku xwe zêdetir bişidîniyê. 'Bişidîne, bilbiloko', dar qîrrî, 'yan roj dê derbikeve ji berî sorgul bigihe.'

Wa bilbil pirrtir xwe bi strî ve şidand, û strî xwe gihand dilê wî, û janek dijar xwe di dilê wî re da der. Diwartir, her diwartir dibû jan, û tûjtir û her tûjtir dibû stran çiku ew li ser evînê bû ya bi mirinê kamil dibe, evîna di gorrê de namire.

Û gula sosret bû sorî geş, mîna sorgula esmanê rojhilat. Geş û gurr bûn bersîngên pelan û sor bû wek pagend û yaqûtan dilê gulê.

Lê dengê bilbil qels û lawaz bû û çengokên wî dest bi şepşepînê kirin û ewrek ket ser çavên wî. Lawaztir û her lawaztir bû dengê wî, û wî hest pê kir ku tiştek gewriya wê difetisîne.

Paşî ew cara dawîn strî. Heyva spî strana wî bîst û spêde ji bîr kir û li esmanan vema. Gula sor strana wî bîst û jihalçûyî velerizî û pelên xwe vekirin ber hewayê sar yê spêdeyê. Vedengê strana wî gihand şkeftên li serê giran û şivanên nivistî ji xewa wan şiyar kirin. Strana wî bi rûlên çem re dabezî û wan peyama wê gihand deryayê.

'Binere, binere!' darê bang kir, 'niha sorgul tevav bûye'; lê bilbil ti bersiv neda çiku ew mirî paldayî bû di nav giyayê berr re, strî di dilî re.

Û nîvro yê şagirt pencere vekir û li derê nerî.

49

'Ax çi parçeyek bextiyariyê ye', wî gazî kir; 'ev e sorgulek! Min di hemû jiyana xwe de sorgulek wa delal nedîtiye. Ew wa spehî ye ku piştrast im wê navek dirêj yê latînî heye.' Û wî xwe şorr kir û gul jê kir.

Paşî wî kumê xwe kir serê xwe û sorgul di dest de bezî mala yê profesor.

Keça profesorî li ber derî rûniştî bû û seyê wê jî li ber piyan bû.

'Te got dê li gel min bidansî eger ji te re gulek sor bînim', yê şagirt gotê.

'Ev e bo te sortirîn gula dinyayê. Tu dê wê bi xwe re hilgirî, û dema em bi hev re direqisin, ew dê ji te re bibêje ka ez çend ji te hez dikim.'

Lê keçikê eniya xwe lê qirmîçand.

'Mixabin ew li cilên min nayê', wê bersiv da, 'û, di ser re jî, birazayê dîwanîyekî hin dirr û cewerên rastîn ji min re şandine, û her kes dizane ku ew pirr ji gulan bihadartir in.'

'De ca, bi sond, tu pirr bêminet î', yê şagirt dilmayî got; û sorgula xwe avêt erdê, û sorgul ket cokekê, û xirxalek erebaneyekê da ser.

'Bêminet!' keçikê got. 'Ez dibêjim te ku tu pirr bêmarîfet î. Û ca ka tu kî yî? Tenê şagirtokê î. Na, ez bawer nakim ku te ta avzûnên zîvîn jî hebin wek kurrê yê dîwanî bixî pêlavên xwe', û keçik ji ser kursiya xwe rabû û çû hindirr.

'Çi tişteke pûç e evîn!' yê şagirt got dema ji wir dimeşî. 'Evîn bi nîvî jî ne mantiqî ye çiku ew ti tiştî napeyitîne û ew hertim hin tiştan dibêje yên dê neqewimin û tiştên nerast bi mirovan dide bawerkirin. Bi rastî, ew kêr nayê. Û madem di vê serdemê de kêrhatin her tişt e, divê ez li felsefeyê vegerim û metafîzîkê bixwînim.'

Wa ew vegeerî odeka xwe û pirtûkek gir ya tozgirtî derkişand û dest bi xwendinê kir.

50

Wergerandin: 8/2004

Cilên nû yên paşayî

Hans Christian Andersen (1805 – 1875)

Berî çendîn salan hebû paşayek yê wa pirr ji cilên nû hez dikir ku hemû pareyê xwe bi cil û bergan pûç dikir. Ne leşkerê wî û ne jî huner mereqa

wî bûn, û ger ne bo nîşandana cilên xwe yê nû ba, ew ti car li nav gulistana xwe jî nedigerrî. Her saet wî qapût û saqoyê xwe diguherrand, û dema li welatên dî dihat gotin: paşa li dîwanê ye, li vî welatî dihat gotin: "Paşa li cilxanê ye."

Li wî bajarî, yê paşa lê dijiya, cejn û şahî dihatin kirin, û her roj mêvan û gerrvan dihatin wir. Carekê du hîlebaz li bajarî peyda bûn. Ew qaşo cildirû û qumaşvan bûn û wan pesn û senaya xwe dida ku ew spehîtirîn cilên dinyayê didirûn. Hem reng û hem jî dirûv nedîtî bedew bûn û herwa di cilên ew didirûn de ev taybetmendiya seyr û sosret heye: ew mirov, yê ku nikare erk û wezîfeyên xwe bi cî bîne yan jî qewî bêaqil e, wan cilan qet nabîne.

- De bo Xwedê, aha ew in cil, paşa pûnijî. Dema wan li xwe bikim, ez ê tavilê pê bihesim ka kî di dewleta min de nikarin erka xwe bi cî bînin: ez ê di cî de bikarim ji hev bikim ka kî hişmend û kî jî bêhiş e. Bila di zûtirîn demê de ew cil bo min bînin! Û wî têr pare dan fêlbazan daku dest bi karê xwe bikin.

51

Wan du darik bo raçandina qumaşî çikilandin û qaşo lê dixebitîn tevî ku ne deziyek û ne jî derziyek pê re hebû. Bêyî dilê wan bi kesî bişewite, wan birengtirîn armûş û hevrişm û şengtirîn zêrr û zîv xwestin lê hemû xistin cêb û berîkên xwe û bi şev û roj li ber darikên rût dest û piyên xwe dianîn û dibirin daku xelk bawer bike ku qumaşî radiçînin.

- Xwezî min bizaniya ka amadebûna qumaş gihaye kû! paşa di dilê xwe de got û jê re hinekî xweş hat pê bihese ka kî ye bêhiş yan nekar. Ew netirsî ku bi xwe bêhiş û bêşiyar derbikeve lê dîsan jî biryar da ku kesek din li şûna xwe bişîne bo agadariyan. Hemû bajar haydar bû ji sihra qumaş û her kesî dixwest bizane ka cîranê wî çend bêhiş e.

- Ez ê xweş-wezîrê xwe yê pîr bihinêrim nik qumaşvanan! paşayî got. -  
Ew herî baş nixê cilan dinase çiku ew hişyar e û ti kes ji wî baştir erk û  
wezîfeyên xwe bi cî naîne.

Xweş-wezîrê kal çû salona yên cambaz lê mijûlî qumaşên neyî bûn. - Wey  
Xwedêyo! wezîrê pîr ji xwe re got û çavên xwe zîq û biloq kirin. Ez ti  
nabînim! Lê wî ew bi deng negot.

Yên xapînok daxwaz jê kir ku xwe nêzîktirî qumaşan bike û jê pirsîn, ma  
dirûv ne delal û reng ne spehî ne. Wan qumaşên neyî nîşanî wî dan, û  
wezîrê pîrî reben çavên xwe hê beltir kirin lê nikarî ti bibîne ji ber ku ti  
tinebû.

- Bi alîkariya te, ya Yezdan! ew pûnijî. Ma dibe ez bêhiş bim? Min ê qet  
bawer nekira ku mirov dikarin pê bihesin! Ma ez neşêm erk û wezîfeyên  
xwe bi rê ve bibim? Na, nabe ez bibêjimê ku ez qumaşan nabînim.

- Ê, hûn ti basa qumaşan nakin! yekî ji dirûvanan wezîr agadar kir.

52

- Wey, pirr xweşeng in! Bêqam bedew in! wezîrê kal gotê dema ji paş  
berçavkên xwe hêv dikirê. - Ev şikil û ev reng! Belê, welle ez ê bêjim  
paşayî ku ev qumaş pirr bi dilê min e.

- De mala te ava! qumaşvanan gotê û jê re ravekir ka çi reng û çi dirûv li  
qumaşî hatine mezaftin. Wezîrê pîr bi mereq û baldarî, bi sexbêrî û  
hişyarî guh dayê daku li pêşberî paşayê xwe hemû bibêje, û wa kir jî.  
Yên lihbok her dawaya pirrtir pare, armûş û zêrran dikir. Qaşo ew pêdivî  
bûn bo qumaşî. Lê wan hemû dikir kîsê xwe. Yek ta ben jî bo qumaşî tine  
bû lê mêrikan bi lez û bez hewante dixebitîn.

Di nêz de paşayî karmendek xwe yê kêrhatî yê dî hinart cem wan daku  
bizane ka amadebûna qumaşî li çi qûnaxê ye. Ya wezîr bi serê yê  
karmend jî hat: wî kir û nekir ti qumaş nedît çiku ti qumaş nebûn û

darik ripîrût bûn.

- Ma ne qumaşek spehî ye? yên hîleker gotê û delaliya dirûvên qumaşên neyî nîşanî wî da û jê re şirove kir.

- Çawan be ez ne bêhiş im! mêrik di xwe de pûnijî. Ma bi rastî ez nikarim erkên xwe bimeşînim? Ca hê ew kê m bû! Lê nabe ez xwe pê derînim! Lew wî dest bi pesna wî qumaşî kir yê ku wî nedidît û bawerand ku ew heyran û dilbijiyayî rengên qumaşî yên şîrîn û dirûvên wî yên narîn e.

- Belê, ew qumaş bi rastî bêmimûne bedew e! wî ji paşayî re got. Li wî bajarî êdî ji bilî wî qumaşê jêhatî û berkeftî basa ti nedihat kirin.

Ket dilê paşayî jî wî qumaşî bibîne hê dema dihat raçandin. Digel komek camêr û cindiyên giregir - di nav de herdu karmendên wî yên berê çûbûn wî qumaşî bibînin - paşa ket rê û çû bal yên hîlebazan. Çi ji dest qumaşvanan dihat, qaşo teksîr nedikir lê ne dezî û ne jî dirêzî pê re hebûn.

53

- Ma ne gir û giran e! herdu camêrên karmend got. - Paşayê'm, ka ji merdiya xwe hema li van reng û şikilan binere! Ê paşî wan darikên rût nîşanî paşayê xwe dan çiku wan bawer dikir ku bi rastî jî xelk wî qumaşî dibîne.

- Ev çi ecêbî ye! paşa pûnijî. Ez ti nabînim! Ev erjengî ye! Ma ez wa bêhiş im? Ma ez kêrî paşatiyê nayê? Ji vê mezintir bela nikarin bên serê min!

- Wey, pirr delal e! paşayî got. - Ez berztirîn bextiyariya xwe pê dibexşim! Ê wî serê xwe dostane bo daçemand û li darikên rût dinerî bêyî ku biwêre bibêje ku ti nabîne.

Hemû peyrew û civata wî çav bi xwe ve nehêlan hindî fekirinê lê ti kesî ti qumaş nedît. Lê wan hemûyan li gel paşayî digot: "Wey, pirr delal e!" û pêşniya kir ku paşa bi wan cilan derbikeve nav wî karwanê cejn û şahiyê

yê ku dê di zûtirîn demê de hatiba lidarxistin.

- Delal e, şeng e, şirîn e! ji her devî dihat bîstin, û hemû ji qumaşî razî bûn.

Paşayî paye û stêreyên pilebilind bi qumaşvanên hîlebaz bexşandin. Diviyabû cejn li spêdeyê dest pê bike, û hemû şeva berî wê xew bi çavên yê fêlbaz neket û wan li ber ronahiya şazde find û şemalan teksîrî nekir daku xelk bibîne ku ew bêrawestan dixebitin ji bo cil û bergên nû yê paşayî amade bibin. Dirûnvanan qaşo qumaş ji darikan vedikir, bi meqesan hewa dibirî, didirû bi derziyekê ya ku dezî di kunika wê re nebû.

- Va ye, niha cil û berg amade ne!

Dema paşa û mezinên din yê dîwanê hatin, cambazan destên xwe radikirin qaşo tiştêkî pê bilind bikin û digot: - Va ye, ev şelwal e, ev çakêt e, ev eba ye, û ta dawiyê pê ve çûn. - Ew pirr sivik in mîna tevnê

54

tevnîrkê! Dibê qey ti tişt li mirovî nîne dema ev cil lê bin. Lê ji ber hindê ew wa jêhatî ne.

- Rast e! dîwaniyan got. Lê wan ti nedidît ji ber ku ti tinebû.

- Ger ji mezinahî û merdaniya xwe cilên xwe yê niha li xwe ji xwe bikî, yê xapînok got paşayî, - em ê li ber vê neynik û awêneya mezin van cilên nû li te bikin.

Paşayî xwe rûs kir, û hîlebazan qaşo yek bi yek cilên nû yê ku wan qaşo dirûbûn danê. Wan destên xwe li dor wî dialandin daku qaşo şal û şûtikê lê girê bidin, û paşa jî li ber neynikê li dor xwe dizivirî.

- Wey Xwedê, çend xweşik li te tîn! Ew bi spehîtirîn awa hatine fesilandin!

hemûyan bi yekdengî digot. - Ax çi şikil e! Wax çi reng e! Wey çend

bihagiran e!

- Sîwana şerefê, ya ku dê li nav karwanê şahiyê li raserî te bêt hilgirtin, amade ye, Paşayê mezin! rêveberê serekî yê şahiyê ragihandê.

- De ka, ez jî amade me! paşayî got. Ma ne pir li min tîn ev cil? ew li ber neynikê hê carekê li dor xwe zivirî mîna heyranî keşxetiya bejnûbala xwe be.

Berdestikên dîwanê, yên ku diviyabû serê berdayî yê şal û şûtika paşayî hilgirin, destên xwe bi erdê ve radikişandin ku qaşo şalê hildigirin. Ti kesî nedigot ku ew ti tiştî nabînin.

Paşa bi karwanê cejnê re li bin sîbera sîwanê dimeşî, û hemû mirovan li ser kuçe û kolanan û di pencere û şaneşînan de digot:

- Xwedêyo, çi xweşeng û keşxe ne cilên nû yên paşayî! Ca çi şalek şeng e! Way çend xweş li hev tîn!

55

Ti kesî nedixwest bibêje ku ti nabîne çiku dê hingê ew bi xwe diyar bûba ku bêhiş e yan kêrî erka xwe nayê. Ti car berê xelk wa nebûbû heyranî cilên paşayî.

- Lê qet ti cil li paşayî nînin! zarrokek biçûk got.

- Wey Xwedêyo, de guh bidinê, ev zarrokê dilsaf û bêguneh çi dibêje! bavê

wî got, û xelkê ew gotin pistî guhê hev.

- Qet ti cil li paşayî nînin! taliyê hemû gel got.

Tezînek bi ser piştê paşayî de hat çiku wî dizanî gel rast dibêje lê ji xwe re digot: - Çawan be jî, divê ez ta dawiyê tehemilê bikim!

Û wî serê xwe hê bilindtir kir, û berdestikan hildigirt serek wê şalê ya ku qet tine bû.

Wergerandin: 10/2003

Pênc diyariyên jiyanê

Mark Twain (1835-1910)

I

Li spêdeya jiyanê periyek qenc li gel zembîla xwe hat û got: - Ev pênc diyariyên jiyanê ne. Yekê jê bigire, yên dî bihêle. Ê hişyar be, bi hişmendî bibijêre! Wey, bi hişmendî bibijêre! çiku tenê yek ji wan binirx e.

Diyarî pênc bûn: Navdarî, Evîn, Zengînî, Zewq, Mirin.

Yê xort bi coşî got:

- Ti sedem nîne ku zêde bipûnijim.

Ê Zewq bijart.

Ê ew bi dinyayê ket û gerrî li zewqan yên xortaniyê şa dikan. Lê her yek ji wan zewqan jîkurt bû û bûn sedema dilsariyê, bêkêr û bênaverrok bûn.

Ê her zewqê tirrane û tinaziyên xwe pê dikirin dema jê vediqetîn. Taliyê wî got: - Min ev hemû sal pûç borandine. Xwezî min bikariya dîsan bibijarta daku min bi hişmendî bibijarta.

II

Perî dîsan diyar bû û got:

57

- Çar diyarî mane. Vê carê jî bibijêre; lê ax, ji bîr neke - dem diherrike, tenê yek ji wan bihagiran e.

Mêrik pirr pûnijî û paşî Evîn bijart; û haya wî ji wan rondikan nebû yên ku ji çavên periyê hatin.

Piştî çendî çend salan mêrik li mala xwe ya xirrûxalî li ber tabûtekê rûniştî bû. Ew ji xwe re dipeyvî û digot: - Yek li pey yên din ew çûne û ez bi tenê hêlame; û niha ev jî çû, ev ya delaltirîn û dawîn. Kul û derdan li



pey hev daye ser min. Her kêlîka bextiyariyê, ya ku bazirgana fêlbaz angoy Evînê firotin min, min bi hezaran xeman kirriye. Ji kûriya dilê xwe ez Evînê nefret dikim.

III

- Dîsan bibijêre. Ya dipeyivî perî bû. - Salan hişmendî fêrî te kiriye. Divê wa be. Hê sê diyarî mane. Tenê yekê ji wan ti nirx heye - ji bîr neke, û bi sexbêrî bibijêre.

Mêrik dirêj pûnijî û paşî Navdarî bijart; û bi axînên kûr perî derçû. Sal borîn û perî vegerrî û rawestî li pişt mêrik yê ku rûniştî bû û bi tenê bû digel ramanên xwe dema roj ava dibû. Ê perî haydar bû ji ramanên wî:

- Navê min dinya dagirtibû û pesndana min li ser zimanê her kesî bû, û demek kurt ji min ew tiştê baş bû. Lê ax ew çî demek kin bû! Paşî hatin çavnebarî û newehî, paşî kerb û kîn, dawiyê zilm û zordarî. Ê taliya tevan jî dilsojî ya ku gorra şan û navdarî ye. Wey li reşî û rebeniya navdariyê! Bûm hedefa navreşiyê dema serkeftî bûm, bûm armanca tirrane û tinaziyan dema ruxîm.

IV

58

- Hê carekê bibijêre. Ew dengê periyê bû. - Du diyarî mane. Nekeve bêhêvîtiyê. Tenê yek ji wan binirx bû û ew hê jî maye.

- Zengînî - ew hêz e! Ax, ez çend kor bûm berê! mêrik got. - Niha dê jiyana min bibe hejî jînê. Ez dê xerc bikim, pûç bikim, bimezêfim. Hemû yên yariyên xwe bi min dikin û min biçûk dihesibînin dê xwe li nav tozê bigevêzin û ez dê dilê xwe hesûdiya wan têr bikim. Ez dê ji xwe re peyda bikim hemû xweşiyar, şadiyan, jihalçûnan, hemû rezamendiyên li ber dilê mirovan ezîz. Ez dê bikirrim şan û navdarî, bistînim nirx û

nirxdariyê, perêzvaniyê - hemû xweşiyên bêkêr yên jiyânê yên ku li bazarên dinyaya bêwec peyda dibin. Min berî niha bijartinên nebaş kirine û pîrr dem ji dest daye. Hingê ez nezan bûm û min ew tişt baş dihesibandin yên ku tenê baş dixwiyan.

Sê salên kurt derbas bûn û rojek hat ku mêrik li serdavka xwe rûniştibû û direcifî. Ew çilmisî û rengavêtî bû û cilên wî jî perritî bûn. Wî pariyek nanê req dikirrand û diminminî:

- Nalet li hemû diyariyên dinyayê çiku ew tîrrane û derewên zêrrkirî ne! Û bi navên sexte ne, her yek. Ew ne diyarî ne lê deyn in. Zewq, Evîn, Navdarî, Zengînî. Hemû tenê cilên derewîn yên berdembê ne li rûyê rastiyan: Janê, Xemê, Şermê, Hejariyê. Periyê rast digot: di vebijarkiyên wê de tenê diyariyek hebû ku bihagiran bû, tenê yek bû ku ne bênirx bû. Ax çend rezîl û riswa dibînim wan hemûyên din li ber wê ya ku nayê pîvan, ya ku dilîn û şîrîn û nermîn e, ya ku difetisîne xewek reş û bêdawî hemû janên bedenê azar didin û şerm û xemên dilan hildikolin! Wê bîne! Ez westiyame, dixwazim bihedirim.

V

Perî hat, dîsan çar diyarî digel xwe anîn lê Mirin jê kêmbû. Wê got:  
59

- Min ew da delalek ber dilê dayika xwe, zarokek sava. Ew nezan bû û baweriya xwe bi min anî û hêla ez jê re bibijêrim.

- Wey li min ê reben! Bo min çi maye?

- Ma çi maye ku tu ne hejî bî: Ezyeta bêsebeb ya pîriyê.

Mirina Baldassare Silvande

Cîgirê Kontê Silvanyayê

Marcel Proust

Apollo

şivaniya

terşûtewalê

Admetos

dikir,

helbestvan dibêjin. Di her mirovî de yezdanek

heye ku zarî şêtan dike.

Emerson

I

- Alexisê birêzok, wisan negirîn. Hema dibe ku cîgirê kontê Silvanyayê hespekî jî bide we.

- Hespek mezin an canîkekî?

- Belkî hespek mezin mîna yê birêz Cardenio. Lê bi rastî jî dibêjim, niha wisan... li rojbûna çardehsaliya xwe... negirîn!

Çavên Alexis ji pişt rondikan geş bûn dema ew ponijî ku dibe hespek lê bê diyarîkirin û rojbûna wî jî hat bîrê. Lê dîsan jî xemgîniya wî bi temamî 60

xelas nebû çimkî diviyabû ew biçûya nik mamê xwe Baldassare Silvande, cîgirê kontê Silvanyayê. Erê Alexis, piştî bihîstibû ku apê wî nikare sax bibe jî, çend caran çûbûn seredana wî. Lê piştî hingê tişteke wek berê nemabû. Baldassare hay ji nesaxiya xwe bûbû û dizanî ku wî, herî zêde, sê jînsal mabûn. Alexis tê nedigiha ka çawa vê piştrastiyê mamê wî bi xemgîniyê nekuştibû yan dîn nekiribû, û hest pê kir ku nikare li ber xwe bide û apê xwe bibîne. Ew diramî ku mam dê bêguman ji dawiya xwe ya nêz dibû bipeyive û wî dê nikariya xemên mamê xwe vebirevîne û ta dê nikariya rondik û hêsirên xwe jî newerîne. Wî herdem li hember apê xwe, mezintirîn, keşxetirîn, xurttirîn, şengtirîn û dilnermtirîn lêzimê xwe

hurmetek mezin hebû. Wî pirr hez dikir ji çavên mamê xwe yên gewer, simêlên wî yên boz û çokên wî, yên ku jê re di dema zaroktiyê de penagehek bizewq î narîn bûn û dişibîn asêgehek dijmin ticaran nikaribe xwe bigihîniyê, bi qasî hespikên hêsk û colankî xweşik û ji ayingehan jî pîroztir bûn. Bûneweriya reşbîn û tund a bavê Alexis jê re xerîb û necibandî bû û ew di aşop û xeyalên xwe de li pêşerojekê bû ku bi berdewamî li ser piştta hespekî mîna xanimek nazenîn qeşeng û hindî padîşahekî jî wurşedar be, û zelumên mengî û îdeal li ber wî kesên mîna mamê wî bûn. Wî dizanî ku bi xwe jî dişibe mamê xwe yê keşxe û lewend û dizanî ku ew mam jîr, qenc e, bi qasî metranan an generalan bihêz û bibandor e. Erê wî ji gotinên dêbavên xwe fam kiribû ku mamo xwedî hin kêmasiyan jî bû. Ta dihat bîrê ka mam çiqas bînteng bû dema pismamê wî Jean Galéas henek pê dikiran, û herwiha dihat bîrê ka çawa çirîskên çavên mamê wî zewqa wî ya xweperestî peyitandibû dema kontê Parmayê

soz dabû ku xwişka xwe bidiyê (hingê mam ji bo veşartina kêfxweşiya xwe didanên xwe çirrikandibûn û mîna berê lencîbû û girnijîbû ku Alexis qet jê hez nedikir) û dihat bîrê ka çawa Lucretia, ya ku bi fermî jî ji muzîka wî hez nedikir, bênirx dihesiband dema pê re dipeyivî.

61

Dêbavên Alexis bi nerasterêyî hin tevger û kirinên din jî yên mamê wî destnîşan dikiran ku haya Alexis qet jê tine bû lê wî dibihîst ku ew kirin dihatin lomekirin û nifirandin.

Lê hemû kêmasiyên Baldassare, ta lencîna wî ya bêteşe jî, dibe nemabûn. Dema mam zanîbû ku êdî belkî piştî du salên din bikeve nav lîsteya miriyan, jixwe êdî dê henekên Jean Galéas, dostaniya kontê Parmayê û muzîka wî bi xwe çima bala wî bikişandana û wî dê çima li ser wan xem

bixwarana. Di aşop û xeyalên Alexis de mamê wî hê keşxe lê ji berê jî nirxbilindtir û bêkêmasîtir bû. Mam jê re nirxbilind lê di heman demê de yê cîhanek din dixwiya. Ango di bêhêvîtiya kurik de pirtikek xem û tirsê cî girtibû.

Hê ji zû de hesp hatibû xarandin û amadekirin loma êdî dema çûnê bû; Alexis siwarî hentûr û erebeyê bû lê dîsan peya bû û çû şîreta dawîn ji malmamosteyê xwe bipirse. Gava wî dê bipirsiya, bi dijarî rûyê wî sor bû:

- Rêzdar Legrand, kîjan baştir e, mamê min bizane yan nizane ku ez ji mirina wî haydar im?
- Nizane baştir e, Alexis!
- Pa heke wî basa hindê ji min re kir?
- Ew ê neke.
- Ma basa wê yekê ji min re nake? Alexis bi matmayî got çimkî ew tenak vebijark û alternatîv bû ku wî pêşbîniya wê nekiribû: herdem ku di xeyalên xwe de diçû seredana mamê xwe, wî dibihîst ku mamê wî mîna qeşeyan bi dilnêrmî basa mirina xwe dike.

62

- Lê hema heke dîsan jî bas kir?
  - Jê re bibêjin ku ew şaş bûye.
  - Pa heke bigirîm?
  - Spêdeyê hûn jixwe zêde girîne, hûn ê li cem wî negirîn.
  - Ez ê negirîm!? Alexis bi bêhêvîtî qîrî, - lê hingê ew ê bifikire ku ev qewimîn min xemgîn nake, dê birame ku ez jê... ji mamê xwe yê ezîz hez nakim!
- Û dîsan rondik hatin çavên Alexis. Diya wî êdî hew karî lê bipê loma hat kurê xwe; çûn.

Piştî ku sersaqoyê xwe yê biçûk li bersifkê da dest berdest, ê ku taxima cilên wî yên xizmetkariyê li gor arma û nîşana Silvanayê kesk û spî bû, Alexis bi diya xwe re bîskekê rawestî û li dengê kemanê, yê ku ji odeya cîran dihat, guhdarî kir. Paşî serkêşiya wan ber bi odeyek pirr mezin a dîwarcam û gilover ku cîgirê kont ango vîskont pirrî caran tê ve bû. Dema bikevî wê odeyê, dê li pêşberî xwe deryayê bibînî, û heke li ser milê xwe bizivirî, dê mêrg, çîmen û daristan li ber te bin; li kuncikên odeyê du pisîk, sorgul, xaşxaş û gelek alavên muzîkê hebûn. Ew bîskekê sekinîn. Alexis bizirî cem diya xwe, wê fikir kir ku wî dixwest wê bihemêzîne lê kurik bi dengnizmî, dev bi guhê dayikê ve got:

- Mamo çend salî ye?
- Ew ê pûşperê bibe sîûşeş.

63

Li ber devê Alexis bû ku bipirse: "Ma tu bawer dikî ku ew qet bikare xwe bigihîne sîûşeşsaliyê?" Lê newêrî.

Derî vebû, Alexis velerizî, xuzmetkar got:

- Rêzdar cîgirê kont dê aniha bê.

Piştî kurtebîskekê xizmetkar vegeerî û du firindeyên tawis û berxikek, ên ku cîgirê kont bi xwe re dibirin herderê, anîn. Paşî dengê pêngavan hat û derî dîsan vebû.

"Tişt nabe", Alexis, ê ku dilê wî herdem bi bihîstina dengan pît lê dida, ji xwe re fikirî, "bawer dikim ew xizmetkarek e... erê, xizmetkar." Lê di heman demê de dengê nerm hat guhê wî.

- Rojbaş, Alexisko, û rojbûna te pêroz be.

Û gava wî mamê xwe dihemêzand, tirs bi ser de çû. Dixwiye ku mamê wî jî hay jê bû loma, bêyî ku bala xwe bide ser kurik, ew bi tenê hişt daku kurik tirsaxwe vebirevîne, li diya wî zivirî û bi kêfxweşî ew, jinbiraya xwe,

ya ku wî piştî mirina diya di dinyayê de ji her kesî zêdetir ji wê hez dikir, axaft.

Alexis hedinîbû û li hember mamê xwe, yê ku xortemêrek cazîbedar bû û hê hema qet spîçolkîtî jê nedixwiya, yê ku mêrxasî û gernasiya wî ew qas di ser sînoran re bû ku di demên trajîk ên jiyana xwe de jî xwe bextiyar dida xwiyaandin, hest bi dilnermiyek bêxîb dikir. Alexis dixwest xwe biavêje stoyê mamê xwe lê tirsî ku wî bibetilîne û wî qels bike. Awirên mamê wî yên xemgîn û narîn hema dikirin ku Alexis bigirînin. Alexis dizanî ku çavên mamê herdem xemgîn bûn û di bîskên bextiyariyê de jî

64

wisan dixwiya ku ew xemrevînê ji bo kul û kovanên xwe yên nenas hêvî dikan.

Lê di wî kêlîkê de Alexis diramî ku xemgîniya apo bi egîdî qewirandî revîbû çavan ên ku di ber gep û alekên wî yên lawazbûyî û qurmiçî re di bûneweriya wî de tenak endamên bêhîle û rastnîşander bûn.

- Dizanim, Alexiskoyê delal, ku tu dixwazî bi hentûrek cothespî biajoyî, Baldassare got, - sibê hespek dê ji te re bê anîn. Salek din ez ê bi dana hespek din wan bikim cot û piştî salek din ji wê ez ê hentûr û erebeyê jî bidim te. Belkî tu dikarî îsal wî hespî biceribînî û lê siwar bibî; piştî ku vebigerim, em ê bi hev re biceribînin. Çimkî sibê ez ê bi rastî jî biçim, Baldassare lê zêde kir, - lê ne bo demek dirêj. Piştî kêmtirî mehekê ez ê vebigerim û em ê bi hev re biçin pêşaniya nîvroyî ya kenawerî û komediyekê ku min soz daye te jî bi xwe re bibimê.

Alexis dizanî ku mamê wî dê çend hefte li cem dostek xwe biborandina, wî herwiha dizanî ku mamê hê jî dikarî biçe tiyatroyê; lê ramana mirinê wisan kurik xofandibû û ew hê jî di nav kêlbetanên xwe re şidandibû ku gotinên mamê wî ew ji bingehe ve dihêbitand û matmayî dihişt.

"Ez ê pê re neçim", ew ramî. "Ax, mamô dê çiqas biêşe dema qerf û henekên lîstikvanan û ken û coşa cemawer û temaşevanan bibihîze!"

- Ew çî awaza kemanê ya bedew bû me bihîst dema em hatin hindir? diya Alexis pirsî.

- Ay! Ma ew li ber we bedew bû? rûyê Baldassare geş bû. - Ew romans bû ku min basa wê ji we re kiribû.

65

"Ma ew bi xwe pêşkêş dike?" Alexis fikirî. "Çawa serketina muzîka wî dikare di vê rewşê de jî wî kêfxweş bike?"

Tam di wê bîskê de rûyê cîgirê kont vequlipî janek dijwar, gepên wî zerikîn, devê wî beş bû, eniya wî qurmiçî û rondik ji çavan herikîn.

"Wey Xwedêyo!" Alexis di dilê xwe de qîrî, "êdî ew hew dikare xwe kêfxweş

bide xwiyaandin... Weyla mamô rebeno! Lê çima ew ewqas ditirse û naxwaze ku em bi rewşa wî biêşin? Çima ew bela xwe ji xwe venake?"

Lê amaje û girovên têrjan ên felcbûnê, yên ku carinan wisan dikirin mîna ku Baldassare di nav asinan de bê meriçandin û şopên xwe li bedena wî dihiştin û rûyê wî diguherand xerabewêneyek di nav kul û kovanên bijan de, êdî vê carê nerimîbûn.

Piştî ku Baldassare çavên xwe ji rondikan paqij kirin, bi kêfxweşî dîsan dest bi suhbetê kir.

- Wer dixwiye ku dukê Parmayê êdî ji te re ne xweşdest e, ma ne? diya Alexis bi bêahengî pirsî.

- Dukê Parmayê! Baldassare bi hêrs qîrî. - Dukê Parmayê ne xweşheval! Ev hûn çî dibêjin, xwişka delal? A vê spêdeyê wî ji min re peyamek şand û kela xwe ya Illyriayê ji min re pêşnûma kir ku belkî hewayê çiyayî kêrî tenduristiya min bê.



Ew bi lezokî rabû ser xwe lê jana xwe ya dijwar jî bi xwe re şiyar kir loma bêçare ma ku bîskeke rabiweste; hê janê baş bernedabû, wî bang kir jî:  
- Wê nameya li rex doşeka min bînin.

66

Û bi lez xwend:

Hevalê min î ezîz Baldassare,

Çi gas ne xweş e ku ez nikarim bêm we bibînim û hwd.

Bi vê dostaniya mîr rûyê wî geş bû. Lê serdanser, belkî ji bo ku kêfxweşiya xwe, ya ku wî nirxek berz nedidayê, vebişêre, wî didanên xwe çîrrikandin û bi xweşikî lê bi bêteşe bişirî û anî bîra Alexis ku herdem fikiriye ku heman nîşane ji rûyê nearam ê mirinê deng vedidin.

Heman devxwariya Baldassare ya ji Alexis re nas çavên kurik vekirin, nexwe ew li hizûra mamê xwe fikirîbû û hez kiribû li wan rûyan binere ku li ber mirinê ne, yên bi herherî ji rastiya rojane veqetîne ku herî zêde bişirokek bi gernasî neçarkirî, bişirokek dilnêrm î xemgîn, a esmanî û bêzarbûyî belkî bikare biçirise. Niha wî guman nedikir ku Jean Galéas mîna berê karîbû mamo biqehirîne, û dizanî ku di veşariyek di kêfxweşî û di çûna tiyatroyê ya mamê nesax de tine bû, û ku Baldassare ketî ber mirinê jî dîsan her li ser jiyane diramî.

Bi rêya ber bi malê ve ket ramana Alexis ku ew ê jî carekê bimire, û tevî ku hê gelek salên wî yên mamo zêdetir li ber wî bûn, dê dotmama Baldassare, kontesa Alériouvreyê, û herwiha baxçevanê wî yê pîr jî ji wî bi xwe zêde dirêj nejin. Rocoyê baxçevan têra xwe zengîn bû ku bikare xwe vebikişîne bînedana pîriyê lê dîsan jî tê dikoşî daku hê jî zêdetir pare bicivîne û tê dikoşî xelatek şerefî ji bo sorgulên xwe werbigire. Tevî heftêsaliya xwe jî kontesê pirça xwe reng dida û nivîsar, ên ku tê de pesna bûneweriya wê ya ciwanşib, pêşwaziyên wê yên xweşik, servîsên

wê yên kubar dihat dan, bi pare di rojname û kovaran de didan weşandin.

67

Van mînanan qet matmana ji ber tevger û rabûn-rûniştina mamô kêm nedikir; berevajî: hê pêlên hêbetiyê di kurik de dizeximandin ku hêdî hêdî ev matman bû hêbetî û kurik bi wan qonaxan, ên ku jiyane, a wî bi xwe jî pê re, bi paşpaşkî ber bi mirinê ve dibirin, behecand.

Wî bi xurtî biryar da ku ew ê di jiyana xwe de nede pey leylandoka derewîn û ruxîner nebe û mîna peyamberên berê yên bişeref xwe bi çend hevalên xwe yên lîstikan re vebikişîne çolistanekê.

Lê baş bû ku jiyana ji henekkirina bi dêbavan bihêztir bû û wek bervêdan û îtirazekê sînga xwe, ya ku wî hê hemû şîrê çêşîrîn û zeximînende jê veneçikandibû û kaniya wî hişk nekiribû, pêşkêşî kurik kir. Ê kurik dest bi vexwarina bi coş û bi kêfxweşî kir û aşop û xeyalên wî yên dewlemend û jêbawer bi çavşînî guhdarî nalînên wî man û dilsariyên wî pîne kirin.

68

II

Goşt bikovan e, mixabin...

Stéphane Mallarmé

Roja piştî seredana Alexis, cîgirê kont çû kela cîran ku dixwest çend hefteyekan tê ve biborîne bi wê hêviyê ku amadeyiya hejmarek mezin a mêvanan li wir dê bikariya xemên wî, yên ku pirrî caran piştî êşgirtinên wî ew digirt, vebirevîne.

Piştî kurtedemek li kelê, wî hay jê bû ku hemû zewqên wî bala xwe daye ser jinek ciwan. Baldassare hest pê dikir ku jinik jê hez dike lê wî hinekî bi guman û demîngirtî nêzîkî li vê baweriya xwe dikir: wî dizanî ku jinik

bêşert yeke pak e û bi bînfirayî li benda mêrê xwe ye; herwiha wî di hezkirina xwe de jî ti piştrastiyek xurt tine bû û bawer dikir ku handana jinê ber bi rêya xerab ve guneyek pirr mezin e. Lê kengî pêwendiya wî û jinikê rûyê xwe guherand, wî nedikarî bîne bîra xwe. Niha wî wek nîşaneyê ahenga bêpêjn, û ya hema bêdem jî dixwiya, zendên wê radimûsan û destê xwe li gerdena wê dialand. Jinik wisan bextiyar dixwiya ku mêrik hê dûrtir çû: pêşî rûyê wê maçand, dû re demek dirêj ew mist da û mizişand, û dîsan çavên wê, gepên wê, lêvên wê, kenda gerdena wê, serê poza wê... ramûsandin. Devê jinika ciwan di dema mistdanan de dibişirî, û awirên wê mîna ava rojê gerimandî diteyisîn. Mistdanên Baldassare bistetir û cesûrtir bûbûn; carekê wî li jinikê nerî; ecêbgirtî ma ji ber spîçolkîtiya wê, bêhêvîtiya wê ya bêdawî, ya ku bi saya eniya wê ya mirrîçok û çavên wê yên girîbar, dilşewitîn û westî, yên ku

69

awirên wan xemgintir bûn ji rondikên ên îşkencedayiyên li ber çarmixandinê yan jî ji yên evîndarên xwe bi ebedî jidestdayî. Baldassare bîskeke çavên xwe li jinikê gerandin; jinikê jî bi têkoşînek bêwêne çavên xwe yên dilovanîxwaz rakirin rastî wî û devê wê yê bicoş di rîqaço û krampên xwe yên bêhaybûnî doza hê maç û ramûsanan dikir. Bi zewqa di biheştbîna ramûsanan û bîranîna mistdana de coşbûyî wan herduyan xwe di hev rapêçandibû û çavên xwe miçandibûn, çavên stemkar, ên ku neynik û awêneya tengasiya giyanên wan bû; wan nedixwest wê tengasiyê bibînin, û nemaze Baldassare çavên xwe bi tundî miçandin mîna celadê wijdan lê bela ku dizane destê wî dê birecife heke li rûyê yê gorî û qurban binere û bikeve derd û kulan li şûna ku xeyal bike ku yê gorî ew kişkişandiye û neçar kiriye ku celad xwe biparêze. Bûbû şev, û jinik hê jî di odeya mêrik ve bû û bi çavên bêrondik fedikir

pêşiya xwe. Wê bi coşek xemgîn destê wî ramûsand û, bêyî ku tişteki bibêje, derket.

Êdî xewa mêrik nehat, ji xwe ve diçû û direcifî dema dihat bîrê ka çawa çavên qurbana şîrîn û nazenîn bi nik wî ve hildiketî û bêhêvî bûn. Di heman demê de ket xeyalên wî ku niha jinik şiyar bû û hest bi tenêti û bêkesiyê dikir. Wî cil li xwe kirin, bi bêpêjnî meşî ber deriyê odeya jinikê û li xwe seqbêr bû deng jê neyê daku, heke jinik raketî be, wê şiyar neke lê herwiha newêriya vebigere odeya xwe bi xwe jî ya ku tê ve erd û esman lê teng dibûn û bîna wî diçikand. Ew li wir li ber deriyê odeya jinikê rawestî û fikirî ku dê êdî bîskeke jî nikare xwe rabigire û divê bikeve hindir; lê paşî pirr tirsî ku hema wijdana wî dê çawa qebûl bike ku jinikê ji wê xewa şîrîn şiyar bike û wê bikişîne nav kul û kovanan ên ku jinik niha jê azad raketîye. Li ber derî ma, geh li ser çokan, geh rûniştî û carinan jî paldayî. Bi berbanga spêdeyê re, sarmayê girtî û hedinî vegeerî odeya xwe, têr nivist û bi dilek xweş şiyar bû.

70

Wan her tişt kir daku wijdana xwe bihedinînin, ew hewisîn kêmbûna ezaba wijdanî û lawazîna zewqê, û piştî ku cîgirê kont vegeerî Silvanyayê, ji herduyan re ji bîskên bicoş î bistem tenê bîranînen şîrîn û sarbûyî man.

71

III

Xortaniya wî diqîrî û wî nedibihîst

Madame de Sévigné

Dema Alexis di rojbûna çardehsaliya xwe de çû seredana mamê xwe, wî, bi qasî xeyalkirî, mîna sala berî wê bi hêz hest bi bandorlêbûn û kartêkeriyê nekir. Siwariya berdewam bi hespên mamê wî daniyê bi

pêşdebirin û xurtkirina hêz û şiyânên wî dilnazikiya wî vemirandibû û hesta saxlemiyê, ya ku ji ber kerese yên nehîni û kêfxweşiyên bihêz ên xortaniyê pêgirî wê ye, di wî de ava kiribû. Dema wî hest pê fikir ku bi çargaviya hesp re sînga wî mîna bawan û babirekan diperçivî, dema zend û destên wî mîna agirê argûnên zivistanan digurmijîn, dema eniya wî hên dibû di nav çilûyê di ber re difirî ku meşa wî dixemiland, dema dihat malê û xwe berdida nav ava cemidî yan jî dema ew av dişepand û bi nermî serborî û serpêhatiyên xwe dianîn bîra xwe; hemû vê yekê şahiyên hêzên jiyânê di wî de dibişkivandin. Ev hêz, ên ku carekê ji Baldassare serbilindiyek bicoş bûn, ew bi herherî bi cî hiştibû û raguhezîbûn daku dilên xorttir, ên ku ew ê jî carekê neçar bibin dev jê berbidin, geş bike. Alexis dê êdî ji ber lawaziya mamê xwe zivêr nebûya, û ji ber dawîlêhatina jiyana wî nemiriya. Tevgerên dilşadiyê yên xwîna wî di demarên wî de û dilxwaziya wî ya li hember jiyânê nedihîşt ku ew nalînên ê nesax bibihîze. Alexis gihabû wî jiyî ku bedena mirov lê seray û eywanên xwe di navbera xwe û giyanê wisan asê ava dike ku hema giyan rasterê wendabûyî û nemayî dixwiye ta ku rojekê nesaxî yan xemgînî kunikekê dikirîne û giyan tê re serê xwe dertîne. Alexis nasyarî nesaxiya mirinê ya mamê xwe bûbû mîna ku mirov çawa hewisî her tiştî dibe ku li

72

derdorên me didome, û tevî ku mam hê dijiya jî, rewşa wî carekê kurik giryandibû mîna ku çawa yên dimirin me digirînin loma, bi hesibandina mamê xwe wek kesek mirî, Alexis êdî rewşa wî ji bîr kiribû. Dema mamê wî wê rojê jê re got: - Alexisê delal, ez ê hentûran jî bi hespê duyem re bidim te, ew tê giha ku mam difikirî: "çimkî wek din ez ê negihim hentûran bidim te", û wî dizanî ku ev raman di serê mam de bêsinor kovandar bû. Lê kurik hest bi vê yekê nekir çimkî di wî de êdî cî

ji xemgîniya kûr re tine bû.

Çend rojan derengtir pirtûkekê ew matmayî hişt ku basa keleşekî dikir ku dilnazikiya lêzimek wî yê li ber mirinê dilê wî pê nedişewitand.

Êvarê xewa wî nehat dema diramî ku ew bi xwe jî dişibe wî keleşî. Lê roja piştî wê wî rêwîtiyek biserketî ya siwariyê kir, wisan baş xebitî, hest bi dilnermîyek wisan mezin li hember xizmên xwe kir ku bi bêxemî xewq kir û bi bêserêşî raket xewê.

Birêveçûn ji cîgirê kontê Sîlvaniyê re êdî ewqas dijwar bû ku hema êdî qet ji kela xwe dernediket. Xizm û dostên wî teviya rojê pê re diborand, û

dikarîbû bê dîtin ku tevgerên herî şêtane û pûçkirinên bêwêne yên malîyetê wî dikirin, îddîayên dûrî aqil pêşkêş dikirin û xwe di xerabîkariyên sosret didanî bêyî ku xizmên wî lomeyan lê bikin an jî dostên wî henekan pê bikin an jî li dij wî derbikevin. Wer dixwiya ku bi bêpêjnî barê berpirsiya gotin û kirinên wî ji ser milî hatibû rakirin.

Nemaze diyar bû ku dihat xwestin ku bi nerimandina bi dilnermî û daçemandina bi mistdanan neyê hiştin ku ew dengê bedena xwe, ya ku ji bingeh ve hildihejî dema jiyanê hêdîka dev jê berdida, bibihîze.

Wî bîskên dirêj û xweşik li ser doşeka xwe bi xwe re diborandin; wî ticaran di jiyana xwe de xwe bi xwe venexwendibû şîvê. Wî hest bi

73

kêfxweşiyek têrxem dikir dema cil li bedena xwe ya biêş dikirin û pala xwe dida milbenda paceyê û radestî nerîna li deryayê dibû. Wî ev cîhan bi wênayan, ên ku hê jî di wî de dijiyan lê ji ber navber û beredayîtiyê xwedî bedewiyek bêkifş bûn, rapêçand bûyera mirina xwe ya ku hê ji mêj de di serê xwe de nijinandibû lê ew hunereser hê jî bi xemgîniyek bicoş ava dikir. Di aşop û xeyalên wî de xatirxwestina ji duçes Olivianeyê,

dosta wî ya platonîk, a ku hukumrana saloneyê bû tevî ku heke hemû mêmên payebilind ên esilzade, hunermend û ronakbîrên herî navdar ên Ewropayê lê bicivîna jî, teşe digirtin. Wî di serê xwe de suhbeta xwe û wê ya dawîn dixwend:

"... Roj ava bûbû, û deryaya di nav darsêvan re dibiriqî şîn bû. Ewrikên şîn û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm û mîna neqşên li ser kêlên goran herdem-şên li qeraxa esman hildifirîn. Koma spîndaran di tarîgewrikê de biskên xwe berdabûn ser komsorgulên dêrê; tîrojên dawîn çeqên wan direngandin, bêyî ku dest biavêjin qurmên wan, û wîşiyên ronahiyê bi caxên wan ên bersîber ve didaliqandin. Ji bakok biheştbîna deryayê, ya pel û belgên terr û şil û ya şîr hildifûrî. Ticaran dîmen

û

xwiyanga

Silvanyayê

wiha

bi

têzewqî

êvara

tijîxem

nexemilandibû."

- Min ji we hez kiriye lê mixabin kême daye we, dostê reben, di xeyalên wî de duçesê jê re digot.

- Hûn çî dibêjin, Oliviane? Çawa we kême daye min? We herdem ji daxwaza min zêdetir daye min û bi rastî gelekî jî zêdetir ji hindê ku heke sehekan di evîna me de par hebûya. Wek hûn kesek serxwezayî bin mîna madonnayê û ruhsivik bin wek şîrdiya min, ez heyranî we bûm û we jî ez dilorandim. Evîna min pevgirêdanek bû ku ti xwestekê bedenî nedikarî

tûjbîniya wê ya hişmend nerehet bike. Û ma we wek hemberxelat ne dostaniyek bêwêne, çayek bêpayan biçêj, suhbetên naveroktîjî û çendîn

74

destikên sorgulan dan min? Tenê we dizanî çawa bi destên dayikane û axivger eniya min a tagermî hên bikin, hingiv berbidin nav lêvên min ên peritî, mînakên cewer bidin jiyana min. Dosta ezîz, ka ez destê we rabimûsim...

Tenê Piaya xemsar, dotmîrek hûrik a syrakusî, ya ku Baldassare hê jî bi hemû hest û bînahiyan jê hez dikir lê ya ku bala hemû evîndariya xwe ya bicoş dida Castruccio, carinan ew jiyana stemkar, a ku Baldassare dixwest ji bîr bike, dianî bîrê. Ta rojên dawîn jî wî beşdarî li şahî û roşanan dikir û dema bi vê dotmîrê re di ber pozberê xwe re diborî dixwest ku wî biqehirîne û şehmezar bike lê dema bi keçikê re dimeşî jî, hay jê dibû ku çavên wê yên kûr li evîndariyek din digerin lê wê, tenê ji ber ku li ber ê nesax diket, dixwest vê yekê vebişêre. Lê êdî Baldassare nedikarî biçê şahiyên jî. Lingên wî ew qas goc bûbûn ku wî nedikarî biçê derve jî. Lê dotmîr gelek caran dihat seredana wî û, tam mîna ku ew jî bi yên din re ketibe nav komployekê, ew bênavbirr bi nermî û nazenînî dipeyivî û ticaran wek berê ev nermiya xwe bi qîrînek xemsar û diyarkirina xeyidîna xwe nedişkand. Û Baldassare pê dihesî ku wî ji vê dilnermiya wê ji seredana hemû kesên din zêdetir dilaramî distand. Lê rojekê, dema ew ji ser kursiyê rabû daku biçê ser sifreyê, xizmetkarek matmayî dît ku ew pirr baştir dimeşe. Wî bangî nojdar kir. Roja din ew baş dihat û diçû. Piştî hefteyekê êdî destûr jê re hat dan ku biçê derve. Hingê di xizm û dostên wî de hêviyek bêsinor vejî. Nojdar texmîn kir ku nesaxiyek demarî ya dikare sax bibe êşa felcê dabûyê ku niha bi rastî jî ev êş wenda dibû. Wî gumana xwe wek rastî pêşkêşî Baldassare kir û got:



- Hûn hatine sitirandin û saxkirin!

Yê darizandî mirinê bi efûya xwe gelekî kêfxweş bû. Lê piştî demek diyarbûna saxiyê, xema rêveker dest pê kir kêfxweşiyê ji pêşiya xwe

75

vebide. Ji bahozên dinyayê parastî, di nav dilnermiya li derdorê, aramiya ji neçarî û ponijîna azad de mirinxwaziyê ew girtibû. Hê ti şik di serî de tine bûn lê hest bi tirsek nekifş dikir dema diramî ku divê ji serî de dest bi jiyana bike, neçar bimîne ku xwe li ber darbeyên xerîb bigire û sereguhiya li derdorî xwe ji dest bide. Herwiha wî bi şêlîkî hest pê kir ku nexweş bû zewq û tevgerên xwe yê dema nesaxiyê ji bîr bike piştî ku xwe ango destebirayê sosret, ê ku wî pê re bi saetan hem ji dûr û ji nêz ve suhbet kiribû dema lê dinerî ku belem û keştîkan ava deryayê dişeqand, nasîbû. Tam mîna hest bike ku di wî de evînek nû, evînek hê nenas li hember jînwarê wî biwelide mîna di kesek hê ciwan de yê ku li welatê şaş bûbe û ji nû welatê xwe binase, wî jî bêriya mirinê û penaberîya herherî, ya ku hest kiribû ku ber bi wê de bi rê ketibû jî, dikir. Wî ramanek pêşkêş kir, û Jean Galéas, ku dizanî ew sax bûye, bi tundî li dij derket û henekên xwe pê kirin. Jinbiraya wî, ya ku her spêde û her êvar dihat seredana wî, ev du roj bûn nehatibû. Ev yek êdî ji hedê wî der bû! Wî hê ji mêj de nîrê jiyane ji bîr kiribû û êdî nedixwest wî hilbigire ser milên xwe. Jiyane bi çekên xwe yê xweşik xwe nedîavêt hemêza wî. Hêz û şiyane wî dîsan lê vegehbûn û bi wan re hemû xwestekên jiyane jî: ew derdiket, dîsan dest bi jiyane kir û carek din jî di xwe de mir. Mehek dû re êş û jîyanê wî dîsan lê vegehbûn. Hêdî hêdî, mîna cara berê jî, dîsan livîn jê re dijwar û dû re jî negengaz hat daku ew dîsan ber bi mirinê de vebigere. Di vê nûbûna nesaxiyê de hema ew sude jî tine bû ku ew ji jiyane vebiqete, ne daku wê wek rastîn bibîne lê daku wek tabloyekê lê

binere. Berevajî wê carê, niha ew her xweperesttir û xeyidîtir dibû dema bêriya wan kêfxweşiyên, ên ku êdî nedikarî para xwe zewqê jê bistîne, dikir.

Tenê jinbirayê, ya ku wî bi dilnermî jê hez dikir, hin geşî dida dawiya jiyana wî dema bi Alexis re her roj çendîn caran dihat seredana wî.

76

Danê êvarekê, dema jinbira diçû nik wî, bi rê ve hespên erebeya wê zîçikîn; ew bi tundî dafirî erdê, û siwarek bi çargavî di ber re borî jî pê lê kir, û serşkestî û bêhişbûyî ew hat gihandin cem Baldassare.

Ajovanê wê yê neselîxî ji bûyerê sitirî zû banga qezayê gihand cîgirê kont ê ku çavên wî di cî de spî bûn. Didanên wî çîrrikîn, çavên wî biriqîn û perçivîn, û di qehrek erjeng de ew li ajovan arizî; lê wisan dixwiya mîna ku qehra wî hawara wî ya bijan diniximand lê vê hawarê di nav gurmijên qehra wî de bi dengnizmî deng vedidan. Tam wisan dixwiya mîna ku kesek nesax li rex wî yê hêrsbûyî binale. Piştî kurtedemekê nalînek lawaz qîrînên qehrê fetisandin, û cîgirê kont bi kinkinkî şewişî ser kursiyê.

Paşî wî xwest rûyê xwe bide şûştin daku jinbiraya wî ji ber şopên xemgîniya wî xeman nexwe. Xizmetkar bi xemgînî serê xwe hejand: qurbana qezayê nehatibû ser hişên xwe. Cîgirê kont du şev û du rojên bêhêvî li ber doşeka jinbiraya xwe borandin. Wê dikarî hema çî gava hebe jiyana xwe ji dest bide. Şeva duyem emeliyatkirin hat ceribandin.

Spêdeya roja sêyem êdî ta daketibû û ya nesax li Baldassare, yê ku nedikarî rondikên xwe bigire û ji kêfan her digirî, dibişirî. Dema jiyana hêdîka hatibû mêvaniya wî, wî nedixwest bibîne lê niha bi xwe bûbû pêrewê mirinê. Bi gefa li hember kesa ji wî re herî hezkirî, mirinê mêrik erjengandibû; wî jî ji mirinê lava kiribû û ew li daxwaza xwe tewandibû. Wî xwe aza, bihêz û serbilind hîs dikir dema hest pê dikir ku jiyana wî bi

xwe ne bi qasî ya jinbiraya wî ji wî re bihagiran bû û ku çava li ber jiyana wê diket ewqas jî jiyana xwe bènirx didît. Wî niha fedikir rûyê mirinê û li şanoya dorberî mirina xwe nedinerî. Wî dixwest heta dawiyê wisan be û êdî radestî derewê nebe ya ku ji wî re bi lidarxistina berxwedanek bedew û navdar li hember mirinê bêşermî û rûreşiyê hilbide gupik û lûtkeya wan û mîna ku çawa nehînên jiyana wî jê şelandibûn, nehînên jiyana wî jî biherimîne.

77

IV

Sibê, sibê û sibê,  
Wiha roj bi roj dem dikûse  
Ta kîteya dawîn a jiyane  
Û her rojekê bi xwe re qeşmer  
Birine gorên tarî. Vebimirîne, vebimirîne şemalê!  
Jiyan tenê sîberek gerok e, lîstikvanek reben e  
Ku dema xwe li ser sehneyê ye  
Lê paşî kesê hay jê namîne: Jiyan çîrokek e  
Tirredînekî vegotiye, tijî deng û pêjn e  
Lê bêwate ye.

Shakespeare, Macbeth

Hest û westîna ji ber nesaxiya jinbirayê nexweşiya Baldassare bi xwe jî lezandibû. Ew aniha ji cem qeşe vegerîbû ku ji bo xerifandina guneyên xwe çûbû cem û bihîstibû ku êdî tenê bi qasî mehekê dema jiyana wî mabû; demjimêr dehî spêdeyê bû, û şirrik baran dibarî. Hin erebe li ber derê kelê sekinîn. Ew duçes Oliviane bû. Baldassare diponijî ku bûyera mirina xwe bike awazek biaheng.

"... Bûyer dê li êvarek sayî biqewimiya. Roj dê biçûya ava, û deryaya di

nav darsêvan re dibiriqî dê rengşîn bûya. Ewrikên şîn û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm dê li qeraxa esman hilbifirîna..."  
Û li dehî spêdeyê, li jêr esmanê beropizdanên xwe nizmkirî û qirêj, di nav şirrikbaranê de duçes Oliviane hat serdena wî; û ji ber ku Baldassare bi nexweşiyê kerixîbû, xwe radestî nixên berztir kiribû û êdî bala xwe nedida efsûniya tişt û kesên payebilind, şirîniya ava jiyane û şan û şoretê, wî tika kir ku ji duçesê re bê gotin ku nesaxiya wî ew pirr lawaz  
78

kiriye. Duçesê kir û nekir, cîgirê kont nexwest wê pêşwazî bike. Jixwe erk û vatiniyek wî jî tine bû: jinikê êdî nixek xwe li nik wî nemabû. Mirinê bi nermî ew bend û girêk, ên ku berî çend hefteyan tirsî koletiya xwe xistibû dilê wî, piçandibûn. Baldassare dixwest li ser jinikê birame lê tiştêk nedihat ber çavên giyana wî: çavên xeyal û bêweciyên wî miçîbûn. Bi qasî hefteyekê ji berî mirina wî jê re basa govend û şahiyên dotmîra Bohemiayê hat kirin û hat ragihandin ku di wan şahiyên de Pia dê bi Castruccioyê roja din ji wir biçe Danîmarkayê re serçemka govendê bi rê ve bibe, û vê yekê Baldassare pirr çavnebar kir û qehrand. Wî bang kir ku Pia bê cem wî. Jinbiraya wî li dijî vê yekê derket lê wî fikir kir ku asteng li ber hevdîtina wî û Piayê tînan danîn û derdor dixwazin ku bêsebeb wî hêrs bikin loma xeydî. Daku ew zêde zivêr nebe, bangî Piayê hat kirin.

Dema Pia hat, mêrik tam aram lê keserkûr bû. Wî jinik kişand ber doşeka xwe û serdanser basa şahiya dotmîra Bohemiayê jê re kir:  
- Em ne xizmên hev in û hûn ê tazî û şîniyan bo min nedeynin lê dixwazim ji we lava bikim: soz bidin min ku hûn ê neçin wan şahiyên. Wan fikir hev û di awirên xwe de giyanên xwe, giyanên kovan lê bicoş, ên ku mirinê nikarîbû bigihîne hev, peyitandin.

Baldassare tê giha ku jinik di sozdana xwe de biguman bû, wî devê xwe xwar kir girnijek bijan û got:

- Na! Sozê nedin! Soza mêrê li ber sekeratê li erdê nedin. Heke hûn ne piştrast bin, sozê nedin.

79

- Nikarim sozê bidim we: ev du meh in ku min ew zelum nedîtiye û belkî êdî qet nebînîm; ez ê hemû jiyana xwe poşman bim heke neçim wan şahiyên.

- Hûn rast dibêjin çimkî hûn ji wî hez dikin, çimkî her hin mirov dê bimirin... û hûn ê bi hemû hêzdariya xwe bijîn... Lê tiştê ji bo dilê min bikin: bi qasî wan bîskan, ên ku we dê li vir şîna min bikira, ji şahiyê vebiqetînin û li derveyê şahiyê bin. Bangî giyana min bikin bila bîskê bi we re bikeve bîranînan, piçê li ser min biramin.

- Bawer nakim bikarim wê sozê jî bidim, şahî pirr kurt e. Tevî ku li kêleka wî mêrî bim jî, bi zor bigihim lê bînim. Ez ê ji her rojek din bîskê bidim we.

- Hûn nikarin, hûn ê min ji bîr bikin; lê heke piştî salek din, mixabin! Heke piştî demek dirêjtir, pirtûkek xemgîn, bûyerek mirinê, êvarek nixte û baranî we li ser min bide fikirandin, ax ê ji min re çi dilovaniyek be! Ez ê êdî ticaran, ticaran we nebînîm... ji bilî di giyana xwe de loma divê em di heman demê de hevdu bi bîr bin. Hûn ê herdem li bîra min bin daku giyana min vekirî be dema hûn bixwazin bikevinê. Lê jina vexwendî mirov pirr dide rawestandî û pandî! Baranê sêrmawezê dê kulîlkên gora min rizandibin jî, pûşperê dê ew sotandibin jî lê hê jî giyana min dê ji ber bêsebrîya xwe bigirî. Ax çiqas hêvî dikim ku hê carekê bîranînekê, salveger û roşanekê yan herikek ramanê we hûn bianîna raserî dilnermiya min; hingê min ê hûn bibihîstina, hûn ê bidîtana, herder dê ji

bo pêşwazîkirina we bi efsûnî bibişkiviya û kulîlk bidana. Li yê mirî  
biramîn. Lê ax! Ma dikarim hêvî bikim ku mirin û bîskek we ya jidil  
tiştêk wisan bi dest bixin ku jiyane, dildariyên wê û rondikên me û kêfa  
me û lêvên me nikarîne bi cî binin.

80

V

Niha şkest dilê cewer... Şevbaş,  
Kurmîrê çeleng! Komên firîşteyan

Bila te bistrînin axa aram!

Shakespeare, Hamlet

Tayên dijwar bela xwe ji cîgirê kont venedikir; doşeka wî hatibû  
raguhezandin odeyek gilover î mezin ku Alexis di rojbûna sêzdehsaliya  
xwe de jî ew pirr kêfxweş tê ve dîtibû, û ku tê ve yê nesax dikarî di  
heman demê li deryayê, pêşkîna strîngehê û ji hêla din ve jî li mêrg û  
daristanokan binere. Carinan ew dipeyivî jî lê di gotinên wî de êdî şopek  
jî ji ramanên berz, ên ku hefteya berî wê ew cewerandibû, tine bû. Wî bi  
dijwarî kesek nedihat dîtin dinifirand çimkî qaşo wî kesî henekên xwe bi  
yê nesax dikirin; wî her xwe wek baştirîn muzîkjenê sedsalê û jêhatîtirîn  
esilzadeyê cîhanê radigihand. Paşî geh ew dihedinî û ji ajovanê xwe tika  
dikir ku bibe meyxaneyekê yan jî hespan ji bo nêçîrê kurtan bike. Wî  
kaxezên nameyê xwestin daku hemû sertacên Ewropayê ji bo bûy û  
dîlana xwe ya bi xwişka dukê Parmayê re vebixwîne; dema ji ber deynê  
xwe yê nedayî yê qumarê ji tirsan dilerizî, kêrek kaxezkî ji ser maseya  
xwe ya şevî radigirt destê xwe û, mîna ku demance be di destan de, tev  
digerî. Wî xizmetkar şandin daku peyamê jê re binin ka qaşo polîsê wî  
şeva berî hingê pelixandî miribû yan na, wî stranên xeberreş û çêrî bi  
kenkî bo jinekê, ya ku qaşo destê wê di destê wî de bû, digotin. Firîşteyên

kuştinê, yê ku wek Şiyan û Viyan tên nasîn, ne amade bûn ku cinên wî yê xerab û xwiwabûnên bênxirx ên bîranînên wî biqewirînin û bipengizînin. Piştî sê rojan, li derdorî demjimêr pêncî şevê ew, mîna ku ji xewek xerab, a ku mirov jê ne berpîrs e lê bi şêlî û nezelaî bi bîr tîne, be, şiyar bû. Ew pîrsî ka xizm û lêzim li hizûrê bûn dema wî bênxirtirîn, necistirîn, genîtirîn û fistewîtirîn para di xwe de derbiribû, û ji ber 81

dîsanhatina teb û cinên xwe, wî tika kir ku xizm û lêzim dîsan bîn ji wir derxistin ta ew dîsan bê ser hişên xwe.

Wî çavên xwe li derdorên xwe yê odeyê gerandin û bi rûkenî li pisîka xwe ya reş, a ku li ser guldanka çînî bi gula krîsantem dilîzî, nerî. Wî fermanî ku hemû mêvan û yê hatî seredanê derbikevin û demek dirêj bi qeşeyê li ber doşeka wî çavdêr re suhbet kir. Lê dîsan jî xwexefirandin red kir û bangî bijîşk kir ji qeşe re bibêje ku zikê wî êdî nikare xwe li ber nanê xwexefirandinê bigire. Piştî bîskekê wî fermanî ku jinbiraya wî û Jean Galéas bîn hindir. Wî got:

- Min xwe radestî mirinê kiriye, bextiyar im ku niha bimirim û bikarim bi bal Yezdan ve biçim.

Hewa wisan nerm bû ku hat karîn pencereyên bi çavkorî li deryayê dinerîn bîn vekirin û pencereyên hêla din, ên ku mêrg û daristan li ber belav dibûn, ji ber bayê pihêt û tund girtî hatin hiştin.

Baldassare nivîna xwe da raguhezandin ber pencereyên vekirî. Keştiyek, a ku deryavanan ji pêlşkîne bi werîsan dikişand firetiya deryayê, bi rê diket. Kurikek keştiyê yê keşxe yê dorî panzdehsalî di ser hêlek keştiyê re xwe dadiçemand; wer dixwiya ku ew ê li ber her pêlê bikeve avê lê ew bi çelengî li ser lingên xwe yê xurt radiwestî. Wî bi torrê masî vedikişandin, û di nav lêvên wî yê ba sûrkirî de qelûnek dûkêldar şorr dibû. û bayê

bawan û babirek diperçivandin lezî gep û alekên Baldassare hên bike û pirtikek kaxezê di odeyê ve bi xwe re rafirand. Baldassare serê xwe zivirand daku êdî hew wê dîmena bextiyar ji zewqan bibîne ku wî bi şeydayî jê hez dikir lê êdî nedibû tam bikiyê. Wî berê xwe da strîngehê: keştiyek bibawan a sêdîrekî xwe ji bo çûnê amade dikir.

- Ew keştî dê biçê Hindistanê, Jean Galéas got.

82

Baldassare kesên li pêhnîk û guverteyê, yê ku destmalên xwe dihejandin, baş nedisehirandin lê texmîn kir ku bêrîkirina xerîbiyê çavên wan şêlandibûn; wan hê pirr derfet ji bo jînê, hevnasînê û pêhesînê hebû. Singê keştiyê hat hilkişandin, qîrînek hilket, û keştiyê berê xwe da rojavayê ya ku lê ronahiyê belem û ewr têkilî mija wê ya zêrîn dikirin û sozên bêwêne û nediyar dipistandin guhên rêvingan.

Baldassare tika kir ku pencereyên aliyê deryayê bîn girtin û yê aliyê mêrg û daristanokan bîn vekirin. Wî berê xwe dida zeviyan lê hê jî qîrîna xatirxwaziyê ya ji keştiya sêdîrekî di guhên wî de dişingî û didît ku kurikê keştiyê, qelûn di nav didanan re, torr vedikişandin.

Destê Baldassare agirane dilivî. Serdanser wî çingînek dengnizm bihîst ku hema nedihat guhê mirov û mîna dilqutînê ji kûr dihat. Ew dengê zengilên dêra gundekî pirr dûr bû ku di hewayê sayî û bayê guncayî de bi çendîn qonaxan di ser deşt û çeman re hatibû daku bigihe guhên wî, daku guhên wî yê seqbêr bibihîzin. Ew dengê nihoyî lê di heman demê de dengê pirr kevnare bû; hingê Baldassare bihîst ku dilê wî jî biaheng bi zengilan re lê dida dema zengil hildifirîn û dil jî radiwestî dema wer dixwiya ku zengilan deng dadimêtin xwe û paşî zengilan jî xwe bi wan dangan re berdida perrên esmanan.

Di hemû serdemên jiyana xwe de dema wî dengê zengilên dêrê dibihîst,



çingîna wan a li êvarek hewanerm dema ew hê kurikek biçûk bû û bi zeviyan ve vedigerî kelê, dihat bîrê.

Hingê nojdar tika ji yên amade kir ku bên nêztir û got:

- Ev dawî ye!

83

Baldassare bi çavên miçandî pal da û dilê wî guhdariya zengilan, ên ku guhên wî yên mirinê felckirî êdî nedibihîstin, fikir. Wî diya xwe didît dema wê kurê xwe dimaçand dema kurik vedigerî malê, dema wê kurik êvaran dinivand û piyên wî di destên xwe de digerimandin û li rex wî dima heke xewa wî nehata; Robinson Crusoe yê wî, stranên xwişka wî êvaran li nav baxçe, gotinên malmamosteyê wî dema pêşbînî fikir ku kurik dê carekê bibe muzîkjenek gewre û xemgîniya bi zor veşartî û niximandî ya diya xwe.

Niha êdî dem û derfet tine bûn ku bendewariya bicoş a dê û xwişkê, ku wî ewqas bi stemkarî xapandibû, bi cî bîne. Wî dîsan zîrfon û ixlemûrek mezin, a ku li binê wê hatibû nîşanîkirin, û roja betalkirina nîşaniyê, ku hingê tenê diya wî karîbû xemên wî vebirevîne, hatin bîrê. Wî xeyal fikir ku matîjêker û xwedîkera xwe ya pîr dihemêzand û kemana xwe ya pêşîn di dest xwe de digirt. Wî hemû ev yek di ronahiyek nerm û têrxem de, di heman dûrahiyê de didît, mîna ku çawa pencereyên aliyê zeviyan jî bi çavkorî berê xwe didanê.

Wî hemû ev yek bihîstibû tevî ku tenê du-sê saniye ji gotinên nojdar "Ev dawî ye!" borîbûn.

Nojdar dîsan destê xwe rakir: - Xelas!

Alexis, diya wî û Jean Galéas bi kontê Parmayê, yê ku aniha gihabû wir, re çok dan. Xizmetkar li ber deriyê vekirî digirîn.

Kewçêr 1894

Pirç nîv dinya

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

Bihêle dirêj, dirêj bên bikim bêna pirça te, rûyê xwe danoqînim nav, wek mirovê tînî serê xwe dike nav kaniyê, û wê bi destê xwe bilivînim, mîna desmalek bênxweş, da bîranînan verevînim hewa.

Xwezî te bizaniya ka çi hemû tiştî dibînim! ka çi hemûyê hest dikim! ka çi hemûyê di nav pirça te de dibîzim! Canê min li nav bêna xweş digere wek çawan canê yên dî di muzîkê de.

Di nav pirça te de tevavek xewnan hene, tijî baberik û karîteyên keştiyan; di nav de deryayên mezin hene ku bayên wan yên pasat min berev seqayên dilhebîn dibin, dibin devera esman lê şîntir û kûrtir, navçeya bêna fêkî, pelan û leşê mirovan ji hewa tê.

Di deryaya pirça te de keştîgehek dixwiye ya mişt e ji stranên xemgîn, ji giregirên hemû neteweyan û ji keştiyên ji hemû dirûvan yên wek avaniyên delal û pirrcore diteyisin li hember esmanê bêsinor, warê germiya herherî.

Di destdana li pirça te hest dikim bi heman rûzerbûnê mîna li odeka keştiyek bedew, li ser dîwanê, li gel borîna demên dirêj, dema hatin û çûna deryayê li keştîgehê bêyî bêt dîtin dihejiya, li nav zembîlên gulan û şepîna ava hînikker.

Li agirgeha geş ya pirça te bên dikim bêna cigareyê ya afyon û şekir têkil; di şeva pirça te de dibînim şîniya esmanê tropîk bêdawî tîrojan dide; li dûlikên bipûrt yên pirça te sermest dibim ji bînen zeytên gûza hindê, miskê û qetranê.

Odeya cêwî

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

Ev ode, ya dişibe xeyalan, ev odeyek bi rastî bênfere ye, û hewayê wê yê neliv rengê xwe dide sorî û şîniyê.

Canê mirov li vir xwe dişo bi betaliyê û bi bêrî û daxwazê gulav dide.

Ditarike, disorike, dişînike; xewnek lezetdar e li dema rojxeyirînê.

Dirûvên mobîlya û raxistekên odeyê dirêj bûne, xilmaş in. Wer dixwiye qey raxistek ketine xeyalan; dikare bêt texmînkirin ku jiyana wan jî hindî ya gulûgiyayan û mîneralan xewnawî ye. Çît û qumaş bi zimanek lal dipeyivin wek gulan, wek esmanan, wek rojên ava dibin.

Li dîwar tek reşkirinek jî ya hunerî nîne. Li ber xeyalkirina pak, li ber çavdêriya danehûrandî, hunera bi rastîniyê ve sinordar, ya lasayî siriştê dike heqaret e. Ev hemû tê ron e û xapînokî kubar e bo bikare ahengî be. Bênek piçekî şil ya bi zor xwiya ya pirrî bijare difirre li vê odeyê ya pêjnên odeya germ ya gulûgiyayan dilê xewto dilorînin.

Muslîn\* mîna baranê boş dadirije li ber pencereyan û doşekê, wek sûlavên berfê dadikeve erdê. Li ser doşekê paldayî ye Zirrxwedê, serdara xewnan. Lê çawan ew li vir e? Kê ew aniye? Çi hêza sihrê ew li ser wî textê han yê xeyalan û zewqê bi cî kiriye? Ferq nake. Ew e! wê dinasim. Ewên han in çav, yên gurriya wan matmanê ji hev şeq dikin; stêrkên tûj û erjeng yên ji tirranetiya wan dinasim! Ew dikişînin nik xwe, bindest dikin û dadiqurtînin xwe awirên çavdêrê nesexbêr. Min pirr car çavdêriya wan stêrên reş kiriye yên mirovan dikin mereqdar û heyranî xwe.

Spasdarî kîjan cinê xêrxwaz bim ku wiha dikarim li nav efsûniyê, bédengiyê, tenahiyê û bênan bim! Wey pakî! Çiku ya em dibêjinê jiyana -  
86

di herî bextiyariya xwe de jî - ne ti hevpar e li gel vê celeb jiyane ya niha

hest pê dikim û ya deqe bi deqe, saniye bi saniye zewqê jê digirim!  
Na! êdî ne hene deqe, ne saniye! Dem wenda bûye; Herherî serdest e,  
herheriya pakiyê!

Lê derbeyeke girane tirsnak gurmî derî, û mîna di xewnên min yên dojehî  
de min wa hest kir qey derbeyek tevrî bi zikê min ketibe.

Û paşî cebanî hat hindirr. Ew îcrakar e yê hat li ser navê qanûnê min  
şkence bike; yara erzanok e ya têt gilî û gazine hejariya xwe bike û  
fihêtiyên jiyana xwe li jiyana min zêde bike; yan berdestkê sernivîserê  
rojnameyê ye û dewama destnivîskê dixwaze.

Odeya biheştî, zirrxwedê, serdara xewnan, Xatûya ba, wek Renéyê mezin  
digot, hemû vê efsûnê li gel gurmîna cebanî deng vedaye.

Çend erjeng e! tê bîra min! tê bîra min! Tam wa! ev odeya bêserûber, ev  
lêgeha bêriya herherî ya min e. Ewên han in raxistekên bêteşe, tozgirtî,  
pelixî; argûna çipên tifê tewizandî bêyî pel û bizot; pencereyên rezîl yên  
baranê xîçik li toza wan çêkirine; destnivîskên verastandî yan nivûnor;  
salnameyek ya bi pênuşê roj û berwarên reş û tarî lê hatine nîşankirin.  
Û ew bêna wê dinyaya dî, ya hemû pêjnên min gêj kirin, li şûna wê tenê  
tama tal ya cigareyê û ca çî bêna fistewî ya kûfîkiyê maye. Hewayê vê  
odeyê yê kerrixîner, yê niha bên dikim, sade bêhêvîti ye.

Li vê dinyayê, ya teng e û wa miştî qirêj e, tenê tişte nas li min dibişire:  
şûşeyek biçûk ya helînek ya efyonê; yarek kevn û tirsnak; wek hemû  
yaran tijî destlêdanxwazî û bêbextiyê ye.

Erê herê! Dem vejeriye, Dem niha tekhêz serdest e; li gel vê pîretewta  
dilan dikerrixîne vejeriyane keriyên Tirsan, Bêntengiyan, Kabûsan,  
87

Enirrîtiyan, û Nevrozan, karwanê wê yê şeytanî. Bawer bikim ku  
saniyeyên aniha diborin bi hêz û bi şengî giran û giring bûne; û her

saniye - dema ji hejokeyê dijene - dibêje: Ez Jiyana im, Jiyana bêhedan!  
Di jiyana mirov de tenê saniyeyek heye ya armanca wê ya pîroz  
ragihandina mizgîniya xêrê ye, ew Mizgîniya xêrê ya di hemûyan de dibe  
sedema xof û tirsek nikare bêt şirovekirin.

Belê, Dem serdest e; wê diktatoriya xwe ya zordar vegerandiye. Û ew bi  
gopalê xwe yê dunişterî min dizextîne mîna gayê cotî bim. - Berev rastê,  
aa-ahewere! Xuh bide, kole! Diyar bike ku sax î: bilive, hey lanetiyo!

—  
Muslîn: Navê çîtek / qumaşek ji pembû ye - çapa kurdî.

88

Bêhêvîtiya pîrejînikê

Charles Baudelaire (1821-1867)

Pîrejînek biçûk ya qirmîçî xwe bêhode bextiyar hest kir dema zarokek  
şîrîn dît ku her kesî dixwest wê nazdar bike û dilê wê xweş bike;  
afirandiyek delal bû zarok, bi xwe jî hindî pîrejînikê nazik û mîna wê  
bêdidan û bêpirç.

Û pîrejînikê xwe nêzî zarokê kir daku lê bibişire û kêfa wê bîne.

Lê zaroka bizdayî bi destkirina pîrejînika qenc ya hişkbûyî perpitî û xanî  
bi qîjîna xwe dagirt.

Hingê pîrejînika çê vegerrî bêkesiya xwe ya herherî, wê li kuncikekî  
rondik barandin û ji xwe re got: - Ji me rebenên pîr boriye ew dem ku me  
dikarî kêfxweş bikin - eger ne ti yên dî - hema dilpakan; û em ditirsînin  
wan biçûkokan jî yên em dixwazin jê hez bikin!

89

Her sermest bin

Charles Baudelaire

Divê mirov herdem sermest be. Tenê hind: tenê ew e hemû mesele. Daku hûn nehesin bi barê giran yê Demê, yê diperçiqîne li we milan û we diavêje erdê, divê hûn hemû demê sermest bin.

Lê bi çi? Bi meyê, bi wêjeyê yan bi qencyê, li gor dilê we. Lê her mest bin. Û ger carinan, li ber deriyê koşkekê, li ser giyayê kesk yê bercoyekê, li bêkesiya odeya xwe ya tarî, hûn piştî daketina yan nemana sermestiyê şiyar bibin, ji ba, ji pêlekê, ji stêrekê, ji firrindeyekê, ji demjimêrkekê, ji her tiştê dibore, diçerixe, distre, dipeyive bipirsin ka çi dem e. Û ba, pêl, stêr, firrinde, demjimêrk dê bibersivîne: dema mestbûnê ye. Ji meyê, ji wêjeyê yan ji qencyê, li gor dilê we.

90

Mirina şair

Reûf Bêgerd

Lerza xweşiyekê bi ser leşî de hat û livlivek xist ser lêvan. Ji wan xweşiyên lezgîn û tavil û seyranê bû ku pirr kêr dibin mêvanî leşên westî û kerrixî. Wek tê zanîn, herdem mîna keştiyek betilî ne û kêr daran li bendera kêfxweşiyê bînavdanê dikin. Bo ku baş tam û çêja wê seh bike, bi qurtekê qedeh nîvî kir. Hilmek kûr li cegera wî da. Ku birûyên wî şidiyan û eniya wî qirmîçokên zirav ketinê, bi dudiliyekê destê xwe bir berîka xwe, bi lez parçekaxezek derxist û berîk daxist. Li saloxdanekê pûnijî, zarokê li nav kolanên varê û veder ket xeyalan, bi evrazî û nişîviyan ve hildiket û dadiket. Ne bi dilê wî bû. Bîskekê berê xwe da aliyekî. Ku dîsan li xwe zivirî, qirmîçokên eniya wî nemabûn. Bi lez qelema xwe deranî, xetek bi ser mirinê de anî û kir jiyar. Mîna ku vêca ji karê xwe piştrast bûbe, milê xwe hejand û ji xwe re got: Ferqa wan çi ye? Herdu jî meseleyên dijwar ên dîrokê ne, du serên cuda û lihevneker û nakok tevî ku bêyî hev jî nabin, him? Diviyabû yek hebe û

ya din na.

Carek din jî helbesta xwe xwend, çavên wî li ser peyvan hedîn û rawestîn. Wek peyv hingiv bin û hing lê bicivin yan jî çav pelatînkên rengîn bin ku bi hêwirî û aramî bên û biçin. Hesenê dostê wî jî bû pelatînk û têkilî helbesta wî bû. Xwest wî bigire lê ti bi destê ve nehat. Axînek kişand û got: Tu dê kengî bê daku bi arezûyek jidil helbesta xwe ji te re bixwînî? Lê Hesen bo wê şeva wî çirayek vemirî bû.

Parçekaxeza xwe pêçand û xist berîka xwe. Ji xwe re got: Eger zû bêt weşandin, destkeftiya wê dê têra vexwarina min û Hesen a çend rojan bike... êê... Ev jî core jiyaneke e, kî dibêje ku ne ji gelek jiyaneke din xweştir e? Êê Hesen çima nehat? Tu bêjî qey tiştêk bi serî hatibe? Ev cîhana aloz û nerind hem li hev tîne û hem jî pelate û belav dike. Ma 91

çima em aşna û şarezayî wê nebin? Ev jiyana pûç her van bi xwe re tîne, tarîtiyê û ronahiyê, bi pirranî ber bi tarîtiyê ve, berev tarîtiyek bêdawî. Ev jî çarenivîs e, em hemî di keştiyek rêwenda de ne, me berê xwe daye nediyariyek bêdawî. Her girav me radikişîne û her pêl me dûr diavêje ta di encamê de em dikevin gerd û zivirokek ber bi kûratiya tarîtiyê bêt ku em şopekê li pey xwe bihêlin.

Qurtek din lê da û henaseyek kûr kêşa. Serê xwe rakir û bi berdana dûkêl re çavê xwe da derî (Dereng e û Hesen her nehat... Dostek mezin û şaîrek behremend e... Tu bêjî bi şev jî neyê? Na... li kû be jî dê vegere koxikê şaîrane. Li wir em ê hê jî vexwin. Ew tine be, ez bi tenê destek jêkirî me, ode wêran û biyan e, tenê şevêkê jî tê ve debar û tehemil nakim.

Odeyek bêserûber bo du şaîrên belengaz... Êê, zêde ye, şaîr di odeyên wiha de helbestên bilîmetane dinivîsin. Cihên wisan ronahiyek, berheyek

wisan didin mirov ku koçkên rengîn qet nikarinê. Ma ne Marx dibêje: "Ku cilên hincirrî û perrîtî li min bûn, min bedewtirîn berhem dinivîsîn lê pîrr ditirsim ku eger cilên xweşik li xwe bikim, ez dê tiştên bêkelk û bêwec binivîsim." Ma ne wisan e? Du textik û maseyek, komek pirtûkan û hin perr û kaxezên bi her hêlê ve belav û pelate bûne, wêneyek Goran li dîwar hilawîstî, bi şevan jî xewa rengîn a sermestî û şaîrane. Êdî çi divê?) Nîv qedehek din jî qurçand. (Xweştirîn dem e ku em bi deng bi hev re helbestan dixwînin. Lê hê jî xweştir ew e ku helbest lal dibe û em bi cotikî digirîn... Hesen îşev li kû yî? Ji her şevê zêdetir niha ez bêrîker im... Helbest û mey û arezû.)

Govend û semaya tilên xwe bi birde-birda xwe re kir yek:

Şevdereng e

serê min canîkek bihêrs e

zîtikan diavêje û dihîre.

Tevî ku deriyên vê dinyayê

92

dîwarek polayî bin jî

niha li vir

ji bilî min û tenêtiyê

ew canîk nehedandiye.

Qedeha xwe ta çipa dawîn bi ser dilê xwe de kir, destê xwe bi serûçavên xwe de anî. Paşî destê xwe kir berîka xwe de û parçehelbesta xwe deranî. Xemek xweşik ket ser rûyê wî, dişibî mijek binefşî. Ji xwe re got: Helbest jiyaneke bi serê xwe ye, wek tê gotin, zimanê xwedayan e. Ev tenêtiya min, esmanê sayî, dara şên, çîrok û şano, hemî bedewî û delalîyên vê jiyane helbest in. 'Neke' û 'here' yên keçan, axîn û nalînên kuran, xwişîn û lemelema kanîkan, berfa rizde û betenan, hemî helbest in. Jiyana helbest



tê de nemîne, dê bibe bûz û qeşayek bêtam û bêbên.

Serê xwe rakir û çavên wî bi wê koma şewl û gulop û ronahiyan ket yê  
ku li aliyê hemberî wî yê yane û meyxaneyê daliqandî bûn, vêdiketin û  
vedimirîn, yek li pey ya din rengên wan diguherîn.

(Ez jî her di wê vemirîn û vêketinê de bûm, di jiyaneke xweragirî û  
xweveşartinê de, dûr ji mey, cixare û jin... De vêca çi maye? Jiyana û  
ezmûnek xweş jî bû, kul û derdên wê bitam bûn. Hingê her tiştî nixê  
xwe yê taybet hebû. Paşî bû zindan û bendîxane... bendîxane û  
meyxane... Bo serwaya helbestê jî dibin alîkar. Di van herdu jiyanan de  
çi li min guheriya? Hîç. Lê cudayiya wan çi ye? Eger rahatî û şarezayî  
dorberî xwe bûyî, her tişt asayî dibe; li wir pêwîstiya min tiştek din hebû,  
li vir bi helbestê heye. Naçar im, mîna Dostoyevskî dibêje: hespê  
erebekêş

im, divê bênavbirr bixebitim an kuçe û kolan dê bibin warê min ê şev û  
rojan. Ey zeman, ji kû ta kû? Ev bextê reş me diavêje nav lîstok û  
yarîkan û bi me dilîze. Lê wek Hemingway dibêje: di yekem şaşiyê de me  
dikuje, nizanî çima, wek encam pêwîst e jî me bikuje, her kes dikare ji vê  
piştrast be lê bo hinan bendewarî divê ta dor bigihiyê. Hesen, îşev li kû  
yî?

Çima nehatî daku mizgîniya vê helbesta xwe ya nû bigihînim te, yan jî

93

wan yadgar û bîranînan ji te re vebêjim ên ku tevî kevnariya xwe jî  
neketine ber penceyên felekê û jengarî nebûne.)

Qedeha dawîn da dagirtin û bi carekê nîv jê nîç kir. Çavên xwe gerandin  
lê ji bilî xwe û berdestkekî li nêzî xwe kes nedît. Ku saet jê pirsî, haydar  
bû ku derengî şevê ye. Bi lez nîveka din jî ji qedeha xwe da ser gewriya  
xwe. Rabû ser xwe û bi yekem gavê re yane û meyxane li ber çavên wî

jêr-û-jor dibû. Ji xwe re got: "Îşev bendewariyê pirr bi min daye vexwarin. Ev hemî ereq bû? Çawan xwe bigihînim malê? Her divê bigihimê û helbesta xwe jê re bixwînim. Raketibe jî, ez ê rabikim."

Xwar-û-lar, bi vî alî û wî alî ve dişewişî ta xwe gihand derve. Li ber derî rawestî û bi dengê bilind got: Li min heram be êdî yane û meyxane ta mirinê!

Xwe spart dîwar û pê ve bi rê ket. Gavên wî diheziqîn û hevsengiya wî têk dibir. Sarmayek bikuj ket leşî. Hatûçûna li kolanan vemirîbû. Sarmayê ta ku diçû zêdetir lerz dixist hinavên wî û gavên wî sisttir dikirin. Ket. Bi ketin û rabûnê re ji xwe re got: Jiyan her ketin û rabûn e, yan rabûn û ketin. Ya giring ew e ku bi temamî neşkê. Tenê neşkê bes e. Lê jixwe hin mirin jî gelek ji jiyane mezintir in. Îşev li kû yî? Çima te ez tenê hiştim? Yan jî ez her tenemayiyek şkestexwarî me?

Pala xwe da dîwarekî. Mîna ku hêviya diloaniyê ji sarmayê bike, serê xwe berev esmanan rakir û birde-birdek kir. Paşî hêz da xwe û li kolana serekî ket rê: Ev kuçe û kolan çol û hol in, ev serêşî û serxweşî jî her helbest in. Îşev ez û helbest û ev gerdûn bûne yek.

Serê wî xwar bû, leşê wî xwe ranegirt, virde-wirde şewişî û ket û li nîveka kolane piyên wî ji gavavêtinê qut bûn. Req rawestî û di heman demê de hest pê kir ku ev kolan gupik û lûtkeyek berz û bilind e ku tenê ew gihayiyê. Lerzekê girt. Ji dûr ve tirimpêlek bi lez hat. Dema nêzîk bû,

94

çend caran hişyarî dayê. Lê şair kevokek çeng û ling şkestî bû, tenê karî berê xwe bidiyê û destê xwe wek ala lê dirêj bike. Deng û hewarek melûl di heman bîskê de bilind bûn, mit bûn û dîsan bilind bûn. Li kinara kolane girêl bû û gindirî, mîna berrikekê li hev hat badan. Tilên destek wî ji berîkê derketin û ketin liv û tevgerê. Xwînek geş ji serê wî hat. Dixwest

tişteki binivîse lê sarmayê rê nedayê. Tirimpêl her ya berê bû, kolana tarî di çavmiçkekê de vehişt û wenda bû. Di xanîkê wan ve Hesên jî her tilên xwe digestin û bendewarî vegeerîna dostê xwe yê şaîr bû daku helbesta xwe ya wê şevê jê re bixwîne.

Çapa orîgînal: Mergî şaîr, 1985

ji soranî: 1/2003

95

Bo xatirê jinê!

'Elaeddîn Seccadî

Hê ew top û tiveng û heytûhot venemirîbûn, roj her roja şûr û tîr û rim û mertalan bû. Ev Tekşê ku wiha dibînî êxtiyar û şil û kor bûye, li dema xwe li hemî devera Gelwaxî wisan navdar bû ku tenê bihata gotin "Tekş hat", ta zarok jî di landik û dergûşan de bêdeng û bêpêjn dibûn.

Xortek nûgihayî bûm, nûbişkivî bûm, min kes di ser xwe re nedidît.

Spêdeyekê rabûm, min xwe amade kir, şaşik û kumê xwe kir serê xwe û tîr hilgirt, mertal da piştta xwe û rim girt destê xwe. Min mehînek hebû, hema difirî, lê siwar bûm û berê min li ciyê nêçîrê li ser rêya xwe tûşî vê karesatê bûm:

Li serê çiyayên Kewle digerîm, ji dûr ve li geliyê tenişta Xirose sawêrek bi ber çavê min ket. Min bala xwe dayê; ku nêzî bûm, diyar bû zelamek derdorî 25-salî, hindî bêjî berkeftî û lihevhatî, şûrek di ber re bû û her birr çekên din jî pê re hebûn û li mehînek kihêl siwar bû. Hê jê dûr bûm, min dît ku ji mehîna xwe peya bû, hefsarê wê xist destê xwe û doxîna xwe vekir û rûniştin mîstinê. Ez giham raserî - hingê dinya wek niha bi dekûdolaban û fêlbaziyan nehatibû tewizandin, bira birayê xwe avêtî ber bextê wî nedikuşt; dijminê xwîndarî jî ba, diviya te jê re bigota: niyeta min xerabî ye, amade be.

Min nerî ku mêrik ranabe. Neçar mam bang bikimê: "Kuro! Rabe ser xwe, siwar be, li vê çolê yan ez ê te bikujim yan tu min." Mêrik her ji ciyê xwe got: "Tu û bextê xwe! Sond bixwe ku ta siwar nebim dest nakî min." Min bi devê xwe jê re sond xwar ku ta siwar nebe, ez ti lê nekim. Vêca rabû doxîna xwe girê da, ket ser rê û hespê xwe bi dû xwe ve kêşa! Ev ji min re pirr seyr bû û min gazî kirê: "Kuro, ev tu çi dikî, de siwar 96

be!" Got: "Te sond xwariye ku ta ez siwar nebim, dest nakî min. Lê ez jî siwar nabim ji ber ku ma ez nizanim ku tu Tekş î!?"

Pirr li min ecêb bû ku wisan digot! Ez lê xurrîm: "Kuro, siwar be, roj dereng e, îro te her tişt ji dest min kir. Yan tu dê min bikujî yan ez te." Lê ev gav yek û ev gav du, ew siwar nebû. Got: "Xwe nadim kuştin; çi dikî bike." Nêzî du seatan bi pey ketim lê ti pê ve nehat! Neçar mam vegerim ser rêya xwe û wî jî bi wî awayî xwe filitand.

\*\*\*

Roja piştî wê dîsan min lez da xwe, siwar bûm û min rast berê xwe da ciyê roja berî wê. Hê negihabûm serê çiya, min dît ku ji dûr ve siwarek têt. Vêca çi hatinek bû? Bi leza ba dilezî. Ji bejnûbala wî min got ku hebe-nebe yê duhî ye, îro heke biçe ber perrên esmanan jî ji destê min xelas nabe.

Min got hê çavê wî bi min neketiye divê ez xwe bigihînimê daku ne ya duhî bîne serê min. Min li qûntara çiya xwe da ber, kê mabû bigihimê lê min tew dît dîsan ji hespê xwe dabezî û wek duh dest bi mîstinê kir! Min got: ya rebî, ev çi bela ye û çawan xwe jê xelas bikim?! Jixwe nabe ew peya ez êriş bikimê. Min xwe negirt, neçar mam û çûm ji pişt ve lê xurrîm: "Kuro, bes e, rabe, wek duh neke! Rabe, yan tu dê min bikujî yan ez te!"

Min dît berê xwe da min û qet dey nekir. Ku min baş lê nerî: kuro manê (naxwe) ev ne yê duhî ye!.. Lê qet pêjneke jê nehat, bi rehetî rabû doxîna xwe girê da, pê li rikêbê na, xwe avêt ser zîna li ser pişta hesp û bi rê ket. Min da pey: "Kuro tu kî yî?" Dîsan her guh neda min û çû. Êdî wisan qehirîm ku hema dê ji kerban biteqîma. Lê xurrîm: "Kuro! Yan tişt û mişt û mehîna xwe bi cî bihêle û here yan jî tu dê min bikujî yan ez te!"

97

Awirek da min û got: "Kuro, here ser rêya xwe, ez ne hevtayê te me. Heke mêranî di te de hebe, min mijûl û matil nakî!" Gotinên wî ji min re seyr bûn çiku wek ji zarokekî re bipeyive wisan got. Min gotê: "Kuro, ev tu çi dibêjî? Yan ez ê xwîna te birijim yan tu ya min. Ma tu li gel kê diaxivî? Bizane ku ez Tekş im, Tekş."

Hema ku min wiha got, min tew dît ku rima wî li ser singê min e. Got:

"Va min tu kuştî yan na?.. De here rêka min berde û zêdetir min gîro û mijûl neke." Rima xwe ji ser singê min rakir û dest bi çûnê kir!

Ku min ev yek dît, ez qehirîm ji ber ku ew bi vî awayî rikeberî min rabûbû. Min ji xwe re got: hey tu nemînî, Tekş, heyf li te û xîreta te! Ev tu li kû yî, ma tu razayî? Dîsan min xwe paşve lê neda û ketim pey û min hê jî xwe bi şêraniyê anî der. Min bang kirê: "Kuro, wek mêran were meydanê. Madem wiha bû, yan tu dê min bikujî yan ez te." Guhê min lê bû ku got: "Kuro, tu li xwînê digerî, malkembax! Ez talûke me, çima beriya min bernadî?" Ta min dest bir şûrê xwe, min hind dît ku pelamarî min kir û ez ji ser mehînê xistim erdê û rima xwe da ser singê min û xencereya xwe da bi stoyê re û got: "Min tu kuştî yan na? De here beriya min berde." Rabû siwar bû û dîsan ket ser rêya xwe. Ku min ev dît, êdî ti tişt ji min nehat. Min xwe avêt hefsarê mehîna wî û got: "Ya te li min kir, hê kesî li min nekiriye. Ji min re bêje tu kî? Û tu kû ve jî biçî, ez bi te re

me!" Serê xwe hejand û got: "Tu dîn bûyî! Hefsar berde; talûke me." Min got: "Nabe, yan kuştin yan hatina li gel te."

Vêca got: "Bira, ez ê biçim nav deryaya xwînê! Ew cî ne ciyê yên wek te ye." Min gotê: "Xwe mijûl neke, ez ji te venabim, dê bi te re bim." Ku dît ti

çare nîn e û ez ji dû wî venabim, got: "Hefsarî berde, siwar be û bikeve dû

min." Bi rê ve hêdî-hêdî serpêhatiya xwe vegot:

"Ez Semsamê Sorsorî me. Min mamek heye, Cîhanbexş, li welatê

Tergeverê ye. Wî keçek heye bi navê Gulendam. Ev heft sal in ku dilê min 98

û wê ketiye hev. Kes nema ku min nekir xwazgîn û cih nema neçûmê lê hê jî çareyek jê re nehatiye dîtin. Daxwaza mamê min next û qeleneke pîr e lê ji min nayê. Ti rê di dest min de nemaye, vêca ez ê biçim wê birevînim!.. Vê jî ji te re bêjim: mamê min hoz û binemalek boş heye, herwiha heft kur jî. Te ez dîtim; her yek ji wan dê çar ên wek min bixin bin lepê xwe! Jixwe nav û dengê çelengî û fêrisiya mamê min jî li hemî deverê belav e. Wê yekê jî dizanim ku destê min lê ranabe lê neçar im ku her biçim. Ev serpêhatiya min e. Dîsan jî tika ji te dikim tu bi rêya xwe biçî, bila serê te jî di vê rê de neçe."

Ku min ev gotinên wî bihîstin, ji dil û derûn û hêz û taqet ketim û ecêbiyekê serê min girt! Min got: "Bira, ez bi te re me û ta serê min bi vê rê de neçûbe, ez te bernadim." Got: "De madem wisan e, yallah, em biçin lê divê ez çî bêjim tu wisan bikî."

\*\*\*

Dazdeh roj û dazdeh şevan me bi çargavkî şeqand, êvara roja dazdehê em gihan ciyekî. Got em dabezin û em peya bûn. Mehînen me berdan

nav wan mêrgan û hat teniştâ min û got:

"Ho, ew konên ji dûr diyar mala mamê min in."

Bi rastî ku min dît, ta çav bisihirîne bêhejmar kon bûn. Got: "Ez ê biçim, vê spêdeyê min bi keçikê re jivan e, ew jî dê bêt û em ê bi elinda spêdeyê re bigihin vir. Heke hingê nehatim, bizane ku tiştêk hatiye serê min. Êdî qet neseke, siwarî hespê xwe bibe û yê min jî bibe û here. Ne ku bikeve serê te ku rabî bi van re şer an tiştêkî bikî.

Tevî hemî wê zîrekî û çelengiya xwe jî, min dît ku ew gelek ditirsî, wisan diyar dibû ku mam û pismamên wî hê ji wî jî pirr bidestûdartir bûn.

Herçi ez bûm, min bi tamamî rengê xwe avêtibû. Rabû şûrê xwe kir kevanê, mertal xist navmilên xwe, rim xist destê xwe, xatir ji min xwest û

bi piyan bi rê ket. Min jî hesp anîn, kurtan jê kirin, êm û alif kirin, av dan û berdan wan çîmenan.

Du par ji şevê borîbûn-neborîbûn min hind dît ku ji dûr ve du tarmayî peyda bûn, bi leza ba dihatin. Pirr pê neçû, min dît Semsam e û jinek li gel e. Şev bû, min her hind dît ku jinek lihevhatî û berkeftî bû. Êdî em rûnenişt, ji min re got siwar be, bi xwe jî siwar bû û jin xist paş xwe, berê xwe da min û got:

"Em biçin. Ta niha dijmin tirs nexistiye min lê carinan li ser milê xwe li paş xwe binere. Heke te dît ku leşkerê hemî dinyayê civiye û daye pey me,

qet guh nediyê û hespê xwe biajo her wek tiştêk tine be û ji min re jî nebêje lê eger te dît heşt siwar tîn, ji min re bêje: êdî xelasbûn nîn e!!!"  
Vêca me qamçî li hespan veweşandin û em çûn. Cevêca çi çûnek bû! Ba û bahoz jî nedigiha me. Carinan min awirek dida paş xwe û wisan em çûn ta berbang û gizingê lê da û dinya bi tevayî ron bû û hingê min

carekê çavek li jinê gerand û min dît ku keçek derdorî 18 salan e, dikarî ne bixwî û ne jî bikî lê tenê li gerdena wê binerî, bejnûbalek dirêj û xweşik hebû, sor û spî, çavên wê mîna mercanan, gep û alekên wê wek sêvên Serdeştê. Pirça serê wê şibî davên reş ên hevrîşmî û armûşî belavî sermilên wê dibû û dadiket navtengê. Vêca çi navteng bû? Te digot qey gerdena ask û xezalan e! Bi rastî jî Gulendam gulendam bû. Gulendam hejî hindê bû ku wî Semsamî ser û canê xwe bo fikir gorî û qurban!

\*\*\*

Roj hilhat û tav û tîrêjên xwe bi ser dinyayê de belav kirin û bi Gulendamê û pirrpirrokên kezî û biskên wê dest bi veşartokanê kir. Bûbû bernîvroya dereng dema ez li ser milê xwe zivirîm û min dît ku heşt siwar - yek li pêş û heft li paş - bi leza birûskan tîn. Ku çavê min pê ket, min bangî Semsam kir ku va ye heşt siwar ketine pey me. Di cî de  
100

Semsam mehîna xwe rawestand û ji min re got: "Êdî xelas!.. Tu vegere welatê xwe lê carinan min bîne bîra xwe!" Bi van gotinên wî dilê min bi wî şewitî, rondik û hêsir ji çavên min barîn. Ew ji mehîna xwe dabezî, hefsarê wê da dest Gulendamê û girî li gewriyê gotê: "Here lê siwar bibe û gerdena min aza ke û kû ve biçî, bi xêr biçî madem her mirada me bi hev hasil nebû!" Herduyan rondik werandin. Ji min re jî got: here li wê dera han raweste û temaşeyî vê pevçûn û milanê bike. Bi xwe jî li ser rê, destikê şûr di destî de, hemberî siwaran wek singekî sekinî!.. Gelek pê ve neçû, siwar gihan wir. Min dît ku yek rihdirêj e û heft xortên nûgihayî li pey wî ne, hemî jî nîşaneyên fêrisî û pelewaniyê li rûyê wan diyar e û agir ji wan dibare. Semsam ji min re got ku yê rîspî mamê wî ye



û yê din jî dûndeya wî ne. Ew hatin hemberî Semsam rawestîn.  
Yê rîspî got: "Semsam, te çima ev agir vêxist! Bo çî li nav hemî êl û eşîra  
Tergeverê te ez ji hîlak kirim!?" Semsam jî gotê: "Mamo, heft sal e rica û  
tika nema min nekir lê te dîsan jî Gulendam neda min daku ez bibim yê  
wê û ew ya min. Te em dan xatirê malê dinyayê. Niha jî tişteke nebûye,  
bêje "min da te" û ez tişteke din ji te naxwazim.

Mam awir da kurek xwe û gotê: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Kur xwe  
wek kêçê tê werkir, ji mehîna xwe dabezî û şûr di destê hat hemberî  
Semsam rawestî. Semsam gotê: "Mamo, bo xatirê Xwedê, nebe sedema  
xwîndariyê di navbera me de, ji ya Şeytan were xwarê." Lê mam dîsan jî  
bangî kurik kir: "De ka serê wî ji min re bîne!"

Li wê meydanê ew herdu darterr, ku hê nû tamijî baxê jiyane bûbûn, bi  
şûr û tîran pev çûn. Dema min dît, min got: wella Semsam rast digot  
dema ji min re diyar kir ku her kurmamek wî dikare çar ên wek wî bixe  
bin lepê xwe. Wisan bi lez bû pevçûna wan ku min nedizanî li liv û  
tevgerên kê ji wan binerim!

101

Bi wî awayî kurik xwe nêzî niv seatê hemberî gurz û pelamarên Semsam  
ragirt. Lê dawiyê ku kurik dihat şûrê xwe li Semsam bixe, vî şûrê xwe  
veweşand sermilê wî û di perasûyê wî yê çepê re derkir! Kurik ket wir.  
Min êdî xwe ranegirt, rondik bi çavên min de hatin xwarê. Min hay jê bû  
ku Gulendam jî qorre-qorr digirî!..

Ku Cîhanbexş ew yek dît, berê xwe da yek din ji kurên xwe û gotê: "Ka  
here serê wî ji min re bîne!" Yek din êriş kirê. Semsam dîsan gazî kirê:  
"Mamo, bo xatirê Xwedê, bes e, bila êdî hew xwîn bi neheqî birije." Mam  
jî

gazî kirê: "Qurban, hê hestiyê piştî te neşkestiye, niha ew jî dê bişkê. De

tu bisekine, hê ev destpêk e!"

Semsam dijî wî jî şer kir û gelek pê neçû ku ew jî kuşt!.. Mam dîsan bang kir yek din ji kurên xwe: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Ew jî hat meydanê û ew jî hat kuştin!

Wisam yek bi yek kurên xwe şandin û bi destê Semsam dan kuştin. Pirr seyr û sosret bû ku ev karesat û bela hemî qewimî lê gotinek tal ji devê yekî dernediket: vî her digot "mamo, bes e", yê dî digot "qurban, hê ev destpêk e"!!!

Vêca ku kes nema, min hind dît ku Cîhanbexş bi xwe rikêb li hespê xwe da û hat raberî Semsam dabezî û got: "Qurban, ta niha şer şerê kaviran bû, niha jî şer şereqoçana beranan e; tu bibîne mamê te dê çi li te bike!" Dîsan Semsam hewar kirê: "Mamo, bila bes be..." Mamo jî gotê: "Qurban, besa çi niha? Were meydanê, were!.."

Mam û biraza li wê deşteçolê, li raserî wan heft termên kuştî û xêrnedîtî, şûr û tîr li hev veweşandin!

Qurban, bawer bike heke bibêjim melekên esman bi çavên tijîrondik hatibûn temaşeyî wê karesatê, qet ne derew e, bawer bike! Ev kurê xort û

ev kalepîr dihatin û diçûn û herdu jî ji şêrên birsî û tî dirindetir bûn.

102

Roj êdî li ber avabûnê bû, tavsork li rojavayê wenda dibû... Carekê Cîhanbexş nirrî: "Semsam, qurban, de êdî bes e! Şûrê xwe dane."

Semsam jî got: "De mamo, tu jî bes bike, ez jî dibêjim bes e!" De vêca binere Feleka xayîn çi dike! Di dema wan şûrên xwe didanîn de, wan berê xwe neda serikê şûrên xwe û xwe jî neparast. Şûrê Semsam kete stoyê Cîhanbexş û serê wî jê firand! Yê Cîhanbexş jî stoyê serê Semsam ji leşê wî dûr avêt! Guhê min lê bû ku got: "Mamo, te qenc kir?" Yê mamo jî li

aliyê din gotê: "Qurban, wiha baş e!"

\*\*\*

Ku ti tişt nema, ancax komkujî û qelaçoya wan bi dawî hat. Neh term di nav xwîna xwe de digevizîn. Min dît ku Gulendamê desmala xwe deraniye û çavên xwe ziwa kirin, yek bi yek çavên wan girtin bê ku qet kinkinekê bike. Vêca çi ket serê min? Min ji xwe re got ku madem ev bela qewimî, bivê-nevê ev keç ji min re ma. Min berê xwe dayê û gotê: "Gulendam, te bi xwe dît ku çi qewimî û rû da. Niha digel min were em biçin. Diyar bû ku Xwedê ez bo te û tu bo min dayî!"

Ku min wiha got, min hew dît got: "Hay ji xwe hebe." Û min hind dît ku ez avêtime erdê û keçik li ser singê min çok daye û got: "Ha, çi dixwazî?" Min gotê bes e. Rabû û got:

"Bira! Ez ji van şêran im ên li vir ketin. Te bi xwe dît ka çawan bûn. Te dît bav û heft bira û dezgirê min Semsam li vir ketin. Ya ji te ve te ji xwe re hingivîn li nav çiya û keçek li nav kelex û miraran dîtiye. Ez ji te re bêjim: ti kesî ta niha piştta me - ne mêrên me û ne jî ya jinên me - nedaniye erdê. Ta niha ez bo Semsam bûm lê bavê min bo pare ev anî serê me! Ji niha pê ve ez bo axê me!"

103

Şûrê bavê xwe - yê Semsam pê hatibû kuştin - rakir, ta min gotê keçê dê çi bikî, li ser leşê Semsam da stoyê xwe û dawêşî ser termê wî û bo hetahetayî bedena herduyan hev hemêz kir!

Êdî tenê ew di dest min de mabû ku li mehîna xwe siwar bûm û bê dest bikim tişteki vegerîm ciyê xwe.

Niha jî ku ew bûyer têt bîra min, kela dilê min difûre û şirrik rondik ji çavên min dibarin.

Qurban, ma heke mamê Semsam pêşî ew next û qelen û şîrbayê zêde ji

wî camêrî nexwesta, dê çima ev bela bihata serî!?

\*\*\*

- îlona 1946 -

ji soranî: 12/2002

Çapa orîjînal: "Le pêrawî afreta!"

104

Li ser jiyane

Xelîl Cibran

Jiyan di deryaya bêkesiyê de giravek e ku zinar hêvî, dar xewn, gul  
bêkesî û çem tînî ne.

Kesûkarên min, jiyana we giravek e ku ji hemî girav û deverên din  
veqetayî ye. Ferq nake çend keştî ji beravên we diçin deverên din an çend  
tên beravên we, hûn her bitenê dimînin ji ber jan û bêriya bêkesiyê. Hûn  
xerîb in ji kesûkarên xwe û dûr in ji dilsoziya wan.

Bira, min dîtîye tu li ser koma zêrên xwe rûniştî yî û ji dewlemendiya xwe  
kêfxweş î - bi gencîne û xezîneyên xwe serbilind î û bawer dikî ku lepa  
zêr xirxalek nepenî ye ya hêvî û ramanên te û xelkê digihîne hev.

Min tu bi çavên xwe dîtî ku tu pêşengiya leşker û artêşa xwe dikî û  
armanca te hilweşandina kel û asêgehên dijminên te ye. Lê ku min dîsan  
carek dî lê nerî, min tenê dilek bêxwedî li paş sendoqên zêr cemidî, di  
rekehek zêrîn a firindeyek tî de dît û di vê rekehê de tenê amanek avê yê  
vale min dît.

Bira, min dîtîye tu li ser tac û textê şan û şerefê rûniştî yî û gel li derdorî  
te ye û pesna mezinahiya te, gernasiya te û hişmendiya te dide û li te  
dinere û mîna ku pêxember bî coşiya giyanê wan hildikeve ber perrên  
esmanan.

Û dema te li bindarên xwe dinerî, min dît ku ji rûyê te bextiyarî, hêz û

coşa serkeftinê dixwiya goya ku tu giyanê wan î.

Lê bibîne, ku min carek din tu dîtî, min dît ku tu bêxwedî li rex textê xwe yî, mîna sergumkiriye yê destê xwe bilind dike û ji sawêr û tarmayiyên  
105

nepenî lava û liyanan dike û bexşandin û dostaniyê hêvî dike - tika dike banek hebe bila bêserûber jî be lê tenê germî û dostanî hebe.

Bira, min dîtîye ku te ji jinek bedew û delal hez kiriye û dilê xwe raspartiye delaliya wê. Dema min dît ku ew bi dilnermî û evînek dayikane li te dinere, min ji xwe re got: Her bijî Evîn ya dawî li bêkesiya vî camêrî aniyê û dilê wî gihandiye dilê yên din.

Lê ku min dîsan lê nerî, min di dilê evîndar de dilek dî yê bêkes dît ku bi giriye xwe bêencam tê dikoşe ji keçikê re nehîniyên dilê xwe derbibe; û di

giyana te ya bi evîne xemldayî de min hê giyanek din a bêkes dît ku mîna ewrên livok bû û bîlasebeb hêvî dikir bikare xwe bike xunav û rondik di çavên dildara te de.

Bira, jiyana te jîngehek bi tenê ye, veqetayî ji yên xelkê. Ew xaniyek e ku çavê ti cîranan nakeve hindirî. Heke ew di nav tarîtiyê de ba, lampeya cîranê te dê nikariya wê ron bike. Heke qûtê pêdivî tine ba, te dê neşiyaba wî ji embara cîranan dagirî. Heke ew li beyaristanekê ba, te nedikarî wî raguhezînî gulistanekê ya bi destên xelkê hatiye çandin û têwerdan. Heke ew li gupika çiyayekê ba, te dê nikariya wê bînî geliyekî piyên xelkê dewisandî.

Bira, tenêtî beşek ji jiyana te ye, û heke ev tenêtî û veqetayîtî tine bûye, tu dê ne tu û ez dê ne ez bam. Eger ew neban, dema min dengê te dibihîst, min ê belkî bigota ev dengê min e; yan dema min rûyê te bidîta, min ê bawer bikira ku ez di neynik û awênayê re xwe dibînim.

---

Ji pirtûka Xelîl Cibran Dengê Mamoste (Voice of the Master) hatiye wergirtin û

wergerandin.

106

Rojnivîska Mirovê Nepêwîst

Îvan Turgenev (1818-1883)

GUNDÊ OVEÇYÎ VODÎ

ROJA 20. ADARÊ 18..

Bijîşk aniha ji cem min derket. Dawiya dawîn tişteke ji min re zelal bû! Piştî ku têr xwe ragirt û gîro kir, dîsan jî nikarî rastiye nebêje. Belê, ez ê di nêz de bimirim, pirr di nêz de. Çem û robar ji qeşa û qeriseyan azad û rizgar dibin û diyar e ku ez ê jî bi berfên dawîn re biherikim û biçim. Kû de? Xwedê dizane! Herwiha deryayê jî. Lê ma çi ye! Heke divê mirov her bimore, hema bila li biharê bimore. Lê ma ne tişteke entîke û tinazî û kenawer e ku mirov belkî du hefteyan berî mirina xwe dest bi nivîsîna rojnivîskê bike? Lê bi rastî ma çima entîke û tinazî be? Ma çima çardeh roj ji çardeh salan an çardeh sedsalan kêmtir giring bin? Tê gotin ku li ber herherî û ebediyê her tişt ne ti tişt e lê jixwe hingê ebedî bi xwe jî ne ti tişt e. Min hay jê heye ku radestî zimandirêjîyê dibim - ma ez ditirsim? Baştir e ku tişteke bibêjim. Li derve şil û ba ye, û li min hatiye qedexekirin ku derbikevim. Gelo ez çi bibêjim? Mirovên xweragir û maqûl basa nesaxiyên xwe nakin; herçi lihevanîna çîrokan e jî, ne karê min e, ne wisan; min şîyan û taqeta bîr û ramanên berz û bala jî nîn in; salixdana derdora min jî bala min nakişîne û min nacoşîne. Lê ne xweş e ku betal bim, dilê min naçe xwendinê jî. Ma gelo dê çawan be heke ez çîroka jiyana xwe ji xwe re bibêjim! Gelekî baş e! Ji berî mirinê ew gelekî

li cî ye û bawer nakim ku kesekî bixeyidîne û sil bike jî. Loma ez ê dest pê bikim.

Derdorî sî sal berî niha ez li malbatek têra xwe zengîn û dewlemend a xwedîerd hatim dinyayê. Bavê min dildarî qumarlîstinê bû. Diya min jinek xwedî rewş û rewîşt bû, jinek bi rastî qenc bû. Min jinek din nas nekiriye ya ku bi qasî wê qencîkirinê jê re kêfxweşî û dilşadî anîbe. Ew di 107

bin barê qencbûna xwe de dinalî û, ji xwe dest pê bike, her kes bi wî barê xwe diêşand. Di jiyana xwe ya pêncî salan de ew bîskekê jî nedisekinî, bêhna xwe venedikir, hertim mijûl û destbişol bû mîna mêrî û gêrikan - lê berevajî wan, wê tiştêk bisûde û mifadar bi dest nedixist. Kirmê di wê de bi şev û roj ew rehet nedihîşt. Tenê carekê min ew rehet û aram dît, ew jî roja piştî mirina wê bû, di tabûtê de. Lê dema min lê nerî, min hest pê kir ku ji rûyê wê matmanek dixwiya; lêvên nîvvekirî, gep û alekên dewisî û çavên nerm î bêliv wiha digotin: "Ax, çendî xweş e ku mirov bêliv paldayî be!" Belê, baş e, erê baş e ku mirov dawîya dawîn ji hesta hebûna nêaram xelas bibe! Lê jixwe niha pirs ne li ser wê yekê ye.

Zarokiya min reş û tarî bû. Diya min û bavê min herduyan ji min hez dikir lê wê yekê jî rewşa min sivik nedikir. Bavo di mala xwe de ne xwedî ti hêz bû û wek mirov jî bêwate bû çimkî wî bi aşkerayî xwe radestî qumara şerm û ya mirov diruxîne dikir. Wî îtîraf bi wê xerabiya xwe dikir lê nedikarî dev ji wê mijûliya xwe xweşdivî berbide loma wî bi sernermî û serşorrî dixwest li malê bêdeng be daku hêjayî jina xwe ya nimûne be. Dayika delal jî barê bextreşîya xwe hildigirt û gelekî bêhnfireh bû û ev bêhnfirehiya wê jî bi pozbilindiyê dagirtî bû. Wê ti carî mêrê xwe lome nedikir, bê gotinekê jî bibêje wê pareyên xwe yên heyî jî didan wî û deynên wî eda dikirin; bavo jî hem li nik dayikê û hem jî li pişt guhê wê

pirr pesnê wê dida lê sebirê wî li malê nedihat, û hema nêzî min jî nedibû, mîna bawer bike ku dê min jî wek xwe biherimîne. Lê ji dirûvên rûyê wî yên xwarbûyî qencîxwaziyek wisan radifûrî, kenê wî yê germ î nearam wisan diguherî bişirînek bibandor, ji çavên qehweyî yên bi qirmîçokên delal dorgirtî evîn û hezkirînek wisan ditîrêjî ku neçar dimam gep û alekên xwe pal bidim gep û alekên wî yên bi rondik û hêsir û firmêskan şil- û germbûyî. Min ew rondik bi desmala xwe paqij kirin lê dîsan ew diherikîn, mîna av ji şûşeyek zêde dagirtî. Min dest bi girînê dikir û wî ez aşî dikirim, piştî min diperixand, bi lêvên xwe yên recifok rûyê min dimaçand. Zêdeyî bîst salan di ser mirina wî re derbas bûne lê hê niha jî 108

dema bavê min ê reben tê bîra min, kinekinên girîn di gewriya min re dixetimin û dilê min hindî bi tîrş û tehlî lê dide û şewatek tijîjan wî diperritîne, mîna ku dibê qey ew dê hê gelekî sax bimîne û bikare bişewite!

Herçi diya min bû, wê herdem bi heman awayî li min dinerî, bi xweşmirovî lê ne bi nermî. Di pirtûkên zarokan de gelek dayikên mîna wê hene, biexlaq û dadperwer. Wê ji min hez dikir lê min ji wê hez nedikir. Belê, tam wisan! Dayika min a qenc ji min re xerîb bû û min bi coşî ji bavê xwe yê gunehkar hez dikir.

Lê êdî bo îro bes e. Min dest pê kiriye û êdî ez ji dawiyê natirsim, çawan jî

be. Nesaxiya min dê wê bi cî bîne.

## ROJA 21. ADARÊ

Îro hewa gelekî xweş e. Germ û sayî ye; tîrêjên rojê li berfa helbar yarî û tinaziyan dilîzin; her tişt dibiriqe, dibe hilm û bixar û dilopan dike; mîna dînan çîveçîva çûçikan e li ber tan û çeperên rengtarî yî hesû; hewayê şil



bi şîrînî û tirsnakî dilê min nearam dike. Bihar tê, bihar e! Li ber pencereyê rûniştî me û di ser robar re li zeviyê dinerim. Ax sirûşt, ey xweza! Çendî ji te hez dikim lê di kûriya xwe de min diyar kiriye ku ez nikarim hema bijîm jî. Binere, ew nêrçivîkê han çawa çengvekirî xwe hildiavêje; ew dihîqhîqe û her dengê jê derdikeve, her pûrtikek di laşê wî re hêz û şîyan, saxlemî û cançakî ye...

Ev dê bibe çi? Dê nebe ti tiştêk. Ew saxlem e û mafê wî heye ji xwe re bistre û bipirrpîrre; herçi ez im, ez nesax im û divê ez bimirim û hew.

Bêsûde ye ku em zêde wê mijarê bidomînin. Û rondik û hêsirên ji sirûşt û xwezayê re diwerînim jî dûrî aqil in. Ka em li çîrokê bi xwe vebigerin.

109

Wek ku min got, zaroktiya min nexweşî û bêkêfî bû. Min ne xwişk û ne bira hebûn. Ez li malê hatim mezinkirin. Belê, ma diya min dê xwe bi çi mijûl bikira heke ez bihatima şandin fêrgehek lêrazanî yan jî xwendegehek dewletê? Jixwe zarok bo hindê ne ku sebirê dêbavan bi wan bê. Bi pirranî em li gund dijiyan, carinan em diçûn Moskovayê. Erê min mamosteya xwe ya navmalî hebû. Ji mamosteyên navmalî bi taybetî Rickmannek elman tê bîra min: vemirî, kizgiryok, pirrî kovandar, afirandiyek felekê-jê-standî ku bi êşek bêderman a xerîbiyê û bêrîkirina welatê xwe yê dûr ketibû. Carinan li ber sope û argûnê, li ciyê teng û fetisek, ku mirov ji ber bêhna tirş a bîreya kevn jê sereder nedibû, çavdêr û matîjêkerê min Mam Vasîlî, bi bernavê xwe Makeqaz, rî netiraşî, qazaxek perritî li ber, rûdinişt. Wî bi kaxezan îskambîl dilîst li gel Potapuskînê cara pêşîn kurkek sîsspî yê ji postê mihan li xwe kirî û li piyan jî gîzmeyên req î dondayî. Ji pişt dîwar Rickmann distrî: Herz, mein Herz, warum so traurig? Was bekummert dich so sehr?

S'ist ja schön im fremden Lande

Herz, mein Herz, was willst du mehr?1

Piştî mirina bavê min em bi berdewamî li Moskovayê akincî û bi cî bûn. Hingê ez dazdehsalî bûm. Bavê min bi êşa şelal û felcê şevê mir. Ew şev ticarî ji bîra min naçe. Ez ketibûm xewek giran wek hemî zarokan lê ta di xewê de jî dengê dihat min. Tawil pê hesîm ku kesekî di çingilê min re girtiye û min radike. Min çavên xwe vekirin, Vasîlî li ber sîngê min rawestibû.

1. Stran bi elmanî ye. Kurdiya wê:

1

Dilo, dilê mino, çima bikovan î?

Çi ye wisan te xemgîn dike?

Jixwe ev welatê xerîb bedew e.

Dilo, dilê mino, hê tu çi dixwazî?

110

- Çi ye?

- Rabe ser xwe, de rabe. Aleksey Mîxaîlîç li ber mirinê ye...

Min mîna şêtan xwe ji nav nivînan hilavêt û bizirîm wir, odeya nivistinê.

Bavê min ser ber bi paşve girêl paldayî bû, rûyê wî sor bûbû û bi jan

dinalî. Girseya mirovan li ber derî civîbû û tirsayî dixwiya. Dengê ketî li

bersifkê pirsî:

- Kesek çûye pey doktor?

Hesp ji govê hat deranîn, çîrrînek ji derî hat, çiraya gov û axurê di odeyê

ve li erdê dişewitî; diya min bi temamî şkestibû û digirî lê bê ku maqûliya

xwe ji dest bide. Min xwe avêt bersîngê bavo, ew hemêzand û got:

- Bavo delal, bavo delal...

Ew bêliv paldayî bû û bi awayek sosret çavên xwe diteyisandin. Min berê

xwe da rûyê wî - tirsek bêçare ez girtim; ji tirsan min, mîna firindeyên bi zorê hatine girtin, dest bi çîpeçîpekê kir. Hê duhêvarê bû ku bavo ez hemêzandibûm bi coşî lê herwiha bi dilek bêkêf, her mîna bizane ku mirina wî nêz bûye.

Bijîşkek xewto, şerpeze û ji bêhna meyê fistewî hat hindir. Dema camêrî bi kêr û çeqokên xwe yên emeliyatê mijûl bû, bavo mir, û roja din, ez, bi kul û xeman aqilsivik bûyî, findek di dest min de li ber maseyê rawestî bûm û bê tiştekî bifikirim min guhdarî nehvirandina strana dengnizm a berdestkê qeşe fikir a ku her carinan bi dengê lawaz ê qeşe dihat sekinandin; carinan rondik bi gep û alekên min de diherikîn ser pistok û bersîngokên min; kê mabû ku ez ê bifetisîma, min bê navbirr li rûyê bêliv ê bavo dinerî, mîna ku ji wî bendewarî tiştekî bim; dayika min li ser çokan lava û dia dikirin û xwe ta erdê diçemand û tewand; carinan serê xwe hêdîka radikir û dema şanexaç dikirin, tilên xwe şidandî datanîn ser

111

eniyê, milan û zik. Tenê fikirek jî di serê min de tine bû, madê min mîna risas giran bû lê min hest pê fikir ku tiştek erjeng û pirr xerab li min diqewime... Hê hingê Mirinê li rûyê min nerî û ez nîşan kirim.

## ROJA 22. ADARÊ

Îro dîsan sar û ewrîn e. Ev hewa ji min re çêtir e. Ew baştir li karê min tê. Do bêsebeb komek hest û bîranînên bêwec hatin bîra min. Rijandina hestan jî mîna qurmikê giyayê lakrîç e: pêşî ku ew tê cûn, qet ne xerab e lê paşî tam û çêjek bêyom nexweş dikeve devê mirov. Ez ê dest pê bikim jiyana xwe bi şêwazek sade û aram bibêjim.

Ango me bar kir Moskovayê.

Lê aniha ket serê min ku ma çima çîrokjiyana xwe vebibêjim.

Na, qet nabe... Jiyana min bi ti awayî ji jiyana bêhejmar kesên din ne

cuda ye. Mmala dêbavan, zanko, xizmetkarî di karmendiyên asayî de, veqetîna ji karmendiyê, çend kesûkar û dost û nas, hejariyek maqûl, kêfên

bê

mezinatî,

mijûliyên

bê

heyûbeyt,

armanc

û

hêviyên

nebilindfîrm ka fermûn bibêjin ma jiyana kê ne wiha ye. Jixwe ez naxwazim çîroka jiyana xwe vebibêjim çimkî ez pirrtir bo xweşiya xwe dinivîsim; û madem serpehatiyên min ne ti şadiyê û ne jî xemgîniyê didin min, di wan de ti tiştekan nixdar û hejî agadariyê nîn e. Baştir e ji xwe re rewîşt û siriştê xwe ravebikim.

Ez mirovek çawan im? Hûn ê bibêjin: kesek tiştekan wisan napirse; rast e. Lê nê (nexwe) ez ê bimirim, bi rastî ez ê bimirim, û diyar e li pêşberî mirinê dê li min bê borîn heke bixwazim bizanim ka ez çi tov teyr im.

112

Piştî ku min ev pîrsa giring ji bîngê ve vekolî û li ser tîr ponijîm û bê ti pêdivîtiyê û pêwîstiyekê ku silbûn û xeyidîna xwe wek wan kesan diyar bikim ên bi tundî bawer piştrast û dilniya ne ji çelengî û fêrisiya xwe, divê ez tiştekan bidim zanîn: ez mirovek bi temamî nepêwîst û nepêdivî me di vê dinyayê de yan jî baştir e bibêjim ku teyrek tam nepêwîst im. Ê sibê ez ê bipeyitînim û îsbat bikim ka çima çimkî îro ji ber persîv û sermayê ez mîna mihan difirfirrim û sereguhdera min a bermalî, Terentyevna,

bela xwe ji min venake:

- Xwe pal de, ezbenî, û têr çayê vexwe...

Dizanim ew çima min aciz dike: dilê wê bi xwe diçe çayê. Çima na? De bila! Ma çima nehêlim rebenê çi jê tê ji min bistîne li van bîskên dawiyê? Hindî ku dem maye.

ROJA 23. ADARÊ

Dîsan zivistan e. Berf gir dibare.

Nepêwîst, nepêdivî... Ax ew çi peyvek xweş e. Çend kûrtir li xwe vedikolim, hind baştir wateya vê peyvê fam dikim. Nepêwîst - belê, nepêwîst. Mirov nikare wê peyvê bo kesên din bi kar bîne. Mirov dikarin xerab bin, qenc bin, jîr bin, mejîreş bin, dilhebîn an dilreş bin lê ticarî nikarin nepêwîst bin... Bi gotinek din, tê bikoşin ji min fam bikin, dinya dikare bê wan mirovan jî hebe lê bêkêrî ne taybetmendiya wan a serekî ye, ne nîşaneyê wan a herî berçav e û dema em basa wan dikin, serê pêşîn peyva "nepêwîst" nayê ser devê me. Lê ez... bo min tiştê din nikare bê gotin: ez nepêwîst im - û hew. Mirovek zêde me - û bes. Diyar e sirişt û xweristê hesaba hindê nekiribû ku ez dê peyda bibim lew ez mîna mêvanek venexwendî û dawetnekirî pêşwaz kirim. Ez dê bi rehetî basa xwe bikim bê ti core tehliyê... Ji xwe hertişt qewimiye û derbas bûye! Di 113

hemî jiyana xwe de min dîtiye ku ciyê ez dixwazim girtî ye. Belkî ji ber ku ciyê ez lê digirim ne ew bûye yê ez lê digerîm.

Ez bişik, şermîn û enirî bûme mîna hemî nesax û nexweşan. Herwiha, dibe ji ber xweperestiya min a zêde be yan jî ji ber avaniya giyana min a biserneketî bi giştî bem di navbera hest û ramanên min de - û di navbera derbirina wan hest û ramanan de - astengek bêhûde, bêçare û dûraqilane hebûye. Ê çi gava min xwestiye wê astengê ji rêya xwe

vebidim, wê girêkê vebikim, dest û lepên min, dêm û rûyê min û hemî hebûna min ketine kelecaniyê û ez ne tenê nesirîştî û nexweristî xwiya bûme ku lê di rastiyê de jî nesirîştî û nexweristî bûme. Min bi xwe hest bi vê kelecaniyê kiriye û dîsan min xwe vekişandiyê nav xwe. Û hingê di min de lehiyên nearamî û bêhedaniyê dest pê kirine. Min her tiştê xwe ferisandiyê û ji xwe re şirove kiriye, xwe û kesên din dane ber hev û miqayese kirine, min anîne bîra xwe aiwr, ken û gîrnij û peyv û gotinên wan mirovan ên ez li pêşberî wan tê koşîme bi ser xwe ve bêm, min hertişt wek kembax be hesibandiyê, bi armanca xwe ya "mîna her kesek din be" kenîme - û di cî de, di nav ken re, ketime nav gola xeman, noqî kul û derdan bûme û dîsan min ji serî ve dest pê kiriye. Bi kurtî: jiyana min mîna çember û xirrxalekî bûye. Şev û roj min bi van pûnijên bijan lê bêber ve borandine. Kê bibêjin, ji qenciya xwe, ka ji min re bibêjin, ma mirovek wiha bo kê yan bo çi mifadar û bisûde ye? Mirovek wiha kêrî çi tê? Çima ev tê serê min, bo çi ez serê xwe dixwim û xwe dikirînim, kî dizane? Kî heye ji min re bibêje?

114

Çend gul ji Gulistanê

Se'diyê Şîrazî

(derketina pirtûkê: sala 656 koçî / 1258 zayînî)

"Ne pêdivî ye ticaran guh bibihîze  
dengê tembûrê, sentûrê û bilûrê.

Ne lazim e çav baxçeyan bibînin  
û poz binase bîna sorgul û nêrgizan.

Heke balguhê pûrtik tine be,  
mirov dikare li ser kevir jî serê xwe deyne,  
û heke evîndar jî ne li ber be,

dikare destê xwe di hemêza xwe de bigire  
lê ev zikê bêxêr, zikê hîlebaz  
nikare xwe bigire heke neyê dagirtin."

ji pirtûka 'Gulistan'

I

6. Tê gotin keyek faris hebû ku wisan bindarên xwe dişelandin û zordarî  
li mirovan dikir ku gel ji ber kirinên wî ji welatê xwe direvî û ji  
tengezariya ji ber hukumeta wî ya hov derdiket. Dema hejmara bindaran  
kêm bû, dahatinên dewletê jî kêm bûn û gefên dijminan jî li ser serê wî  
xurt bûn.

Yê li tengasiyan alîkaran bixwaze,  
divê li rojên aramiyê merd be.

Heke tu ji xizmetkarê xwe re ne baş bî, ew ê biçê.

Xweşdost be, biyanî jî dê bibin xizmetkarên te.

115

Carekê, ku li eywana wî ji Şahnameyê çîroka dawîhatina li serdariya  
Duhak û tacgiriya Ferîdûn hat xwendin, wezîrekî ji padişah pirsî: "Çawan  
Ferîdûn, ê ne xwedî gencîneyan, ne malîyetê û ne jî xizmetkaran bû, karî  
bibe key?" Key bersiv da: "Wek bi xwe jî dizanî, gel bi coş xwe da alî wî û  
ew bi ser ket." "Wey padişahê min", wezîr got, "madem key pêdivîtî bi  
gel

heye, tu çima gel belav dikî? Ma bi rastî jî tu keyîtiyê naxwazî?

Baştir e leşker bi xwîna dil bê têrkirin  
çimkî siltan bi leşkerê xwe serdariyê dike.

Key pirsî: "De çawan mirov dikare gel û leşker bike piştgirê xwe?" Wezîr  
bersiv da: "Divê key merd be daku ew bibin alîgirên wî, û dilovan be daku  
ew hest pê bikin ku li keynişîna wî biewle ne lê mixabin te ti ji van herdu

taybetmendiyan nîn in."

Ne zordar dikare bibe siltan,

ne jî gur bibe şivan.

Key, ê bibe xerabîkar,

dara di bin lingê xwe ve dibire.

Ev şîreta baş ne bi dilê key bû loma ew enirî û wezîr avêt zindanê. Demek dirêj bi ser ve neborî, pismamên siltan serî hildan û mîrnişîna bavê wan berê bi rê ve birî xwest. Gel, ê perîşan bûbû û ji ber zordariyê bêzar mabû, xwe da gel wan û alîkariya wan kir û wiha wan karî key ji ser text biavêjin.

Heke serok zordariyê li binokên xwe bike,

di gavên dijwar de dostên wî jî dê bibin dijminên bihêz.

Ji gel re yar be, tu dê ji neyaran parastî bî

çimkî gel leşkerê padişahên dadperwer e.

7. Di keştiya keyekî de kurek kole yê faris hebû ku ne ti caran derya û ne jî diwariyên rêvingiya deryayî dîtibûn. Ew digirî û gazin dikirin û bedena wî ji serî ta binî dilerizî. Tevî ew hat aştkirin jî, ew nehedinî û aram nebû  
116

û wisan fikir ku bi tevgerên xwe rêvingiya padişah biherimîne lê ti kesekî nedizanî çî bike. Hingê fîlozofê di keştiyê de ji key re got: "Heke payeberziya we rê bide, ez ê lawik bêdeng bikim." Key bersiv da: "Ew yek dê pirr baş û xweşdostane be." Fîlozof ferman da ku kurik bê avêtin deryayê. Lawik du-sê caran xwe binav kir û bi herdu destan xwe bi dûmena keştiyê ve şidand. Ku rê jê re hat dan hilibikeve keştiyê, êdî rûnişt kuncikekî û bêdeng bû. Padişah mat ma û pirsî: "Ev çî aqildarî bû?" Fîlozof bersivand: "Pêşî wî nedizanî ka xeniqîn çî ye û ewledariya keştiyê fam nedikir. Tam wisan, di bihagiraniya saxlemiyê tenê ew



digihin ên nesax bûne."

Tu yê ziktêr, dilê te naçe nanê cehî.

Evîndara min li gor te kirêt e.

Li ber dilê horiyên biheştê agirê pak jî dozeh e

lê ji nişteciyên dojhê bipirse, dê bibêjin ew biheşt e.

Cudatîyek mezin di navbera wan de heye

yê evîndar li ber dilî ye û yê çav li derî ye.

8. Ji Hormiz\* hat pirsîn: "Çi kêmasî li wezîrên bavê te hebû ku te ferman

da ew bên zindankirin?" Wî bersivand: "Min ti kêamsî li wan nedîtî lê

min didît ku ew di dilê xwe de bêsinor ji min ditirsîn û bi min ne bawer

in. Tirsîm ku ew dê min biruxînin ji ber ku ditirsîn wek din ew dê bi xwe

bên ruxandin; û min jî wek gotina aqildaran kir:

Ey aqildaro, ji wî bitirse yê ji te ditirse

tevî tu bikarî di cengê de zora sed wek wî bibî jî.

Mar piyê şivan digezîne ji ber ku

ditirse ku şivan dê serê wî biperçiqîne.

Ma nizanî ku heke pisîk nikare bireve,

ew amade ye çavên piling derbîne?"

117

9. Keyek ereb ji pîriyê nesax bûbû û tam û çêja jiyane ji dest dabû. Hingê

siwarek hat hindir û peyama serkeftinê anî: "Me asêgehek ji we padişah

re desteser kiriye: dijmin hatine girtin, û hemû navçe û leşkerê wê li bin

fermanên we ne!" Key bi giranî axînek kişand û got: "Ev ne ji min re lê ji

dijminên min re mizgînî ye" - armanc bi dijminan mîrasxwerên wî bû.

Ax, jiyana min bi wê hêviyê ve borî

ku rojekê hêviyên min bi cî bîn.

Niha hêviyên min bi cî hatine lê feyde çî ye

çimkî hêvî nîn e ku jiyana derbasbûyî vebigere.  
Destê felekê ji bo nîşana birêketinê li daholê dixist:  
ax çavên min, xatir bixwazin ji serê min,  
ax lepên min, zendên min û milên min,  
xatir bixwazin ji hev.

Dijminê hêviyan ez girtime...

Hê carek din jî, ax hevalno, werin bal min!

Jiyana min bi nezaniyê borî:

li xwe ne hişyar bûm, lê hûn li xwe hişyar bin!

10. Ez li mizgefta navendî ya Şamê li ber gorra Yehya pêxember, silav lê bin, ketibûm nivêjan dema keyek ereb ê ji xerabiyên xwe naskirî hat pîrozgehê. Wî dua û lava kirin û alîkarî ji Yezdan xwest.

Feqîr û zengîn mehkûmên vê herriyê ne

û yên dewlemendtir in, zêdetir pêwîstî bi alîkariyê heye.

Dû re ew li min zivirî: "Derwêş bi coşiya dua û lavayên xwe û dilpakiya tevgerên xwe tînan nasîn; ma tu nikarî bo min dua bikî çimkî ji dijminên xwe yê xerab ditirsim?" Min bersiva wî da: "Li bindarên xwe yê lawaz were rehmê, êdî ne lazim e tu ji dijminên xwe yê xurt bitirsî."

118

Ne durist e destên bêhêz ên hejaran

bi mist û zendên bihêz bîn şkandin.

Ma ne ew, ê li ber ên belengaz nakeve,

ditirse ku heke bikeve, kes dê destê xwe neavêjîyê.

Yê tovê nerind biçîne lê bendewarî berhemek baş be,

bêaqil û xeyalpûç e.

Pembû ji guhên xwe derbîne û dadperweriyê li gel bike

çimkî heke tu nekî, dê carekê Roja Dadê bê.

Mirov endam û organên heman bedenê ne  
çimkî ew ji eynî madeyê hatine afirandin.  
Heke felek li organekê ji wan bê yemanê,  
yên din jî nabînin aramî û hedanê.  
Heke belayên bi serê mirovan tîne ne xema te bin,  
tu ne hêjayî navê mirovan î.

11. Derwêşek, ku duayên wî pîrrî caran qebûl dibûn, hat Bexdayê, û  
basa wî ji fermangirê zordest Hecac ibn Yûsif re hat kirin. Wî bangî  
derwêş kir û got: "Ji min re tiştê baş dua bike!" Derwêş lava kir:  
"Xwedêyo, ruha vî bistîne!" "Wey Xwedê", Hecac ibn Yûsif qîrî, "ma  
duayên baş wiha ne?" Derwêş bersiv da: "Belê, hem bo te û hem jî bo  
hemû misilmanan."

Ax hêzdar, yê tu zorê li bindarên xwe dikî,  
ma ta kengî ev bazar biwec e?  
Ma serokatiya dinyayê dê çi sûdeyê bigihîne te;  
xwezî tu bimirî û zordariyê li mirovan nekî.

12. Keyek dilxerab ji zelamek bawermend pirsî: "Mirov dikare çawan herî  
baş îbadet bo Xwedê bike?" Zalam bersiv da: "Herî baş tu dikarî wisan  
îbadet bo Wî bikî ku nîvî rojê rabikevî û binivî daku hema bîskekê gel  
bikare rehet bijî."

119

Min dît xerabîkerek nîvî roja xwe dinivî  
û min got: "Çêtir e ku ev bela binive".  
Yê razayî û nivistî zêdetir qencyê dike ji dema şiyar,  
baştir e bimire, ne jiyana xwe ya xerab bidomîne.

-----  
IV

5. Galenos dît ku aqilsivikekî di patika zanayekî re girtibû û gotinên pîs lê dibarandin. Galenos got: "Ew ê zana jî bêaqil e, wek din ew ê neketaya wê rewşê."

Di navbera du hişmendana de nîqaş û şerrenîx dernakeve û yê fehma be jî bi yê mejîreş re gengeşiyê nake.

Heke yê bêaqil di bêerziya xwe de zimanek hişk bi kar bîne jî, yê aqildar be dê wî bi dilnermiyê bihedinîne.

Du mirovên jîr bin, deziyek jî dê di navbera wan de saxlem be, di navbera yek sernerm û yek serhişk de jî dê wisan be.

Lê ku herdu alî mejîhişk bin, zincîra asinî jî dê di navbera wan de bişkê.

Zelamek nebaş radyî kesek heqaret kir, yê heqaret lê hatî kir bi baldirêjî got: "Ey mêrê çak, tu çi bibêjî jî, ez hê xerabtir im çimkî ez bi xwe kêmasiyên xwe ji te baştir dizanim."

V

19. Keyek ereb çîroka Leyl û Mecnûn bihîst: ka çawan Mecnûn têk çûbû û tevî hemû jêhatîbûn û peyvbedewiya xwe bi çolê ketibû û hefsarên hiş û aqil ji dest xwe berdabûn. Key ferman da ku Mecnûn bînin pêşberî wî û lome li Mecnûn kirin: "Ma bi te çi kêmasî di ceweriya mirovan de heye? Çima te xwe elimandiye edetên heywanan û hizûra mirovan terk kiriye?"

120

Mecnûn bersiv da:

"Gelek heval û hogiran ji ber evîna min ez lome kirime lê heke wan Leyl bidîtaya, ew ê di rewşa min bigihana."

Xwezî wan, ên min tawanbar dikin, rûyê te bidîta, ey yara dilperitîn,

daku wan bi dîtina te

destê xwe li şûna pirteqalan bibirriya \*

daku rastî diyar bibe: "ev e tiştê hûn ji ber wê min lome dikin." \*

Key xwest Leylê bibîne daku bizane ka çi bedewî ye ku bûye sedema vê tevliheviya giyanî. Wî mirûdên xwe şandin nav hoz û eşîrên ereban daku li Leylê bigerin û wê bînin baxçeyê eywana key. Wan Leyl anî. Key li Leylê nerî û dît ku ew keçek zimanreş û kêmbiha ye û ew qet ne bi dilê key bû çimkî keça herî kêr jî ya harema wî di bedewî û dilhebîniya xwe de di ser Leylê re bû. Mecnûn tê giha ka çi di dilê key de bû loma lezand û got: "Divê di çavên Mecnûn re li derdirûvên Leylê bê nerîn daku bedewiya wê ji temaşevan re xwiya bibe."

Heke kevokên daristana pîroz ew nalînên evîndarî,  
yên min bihîstin, bibihîstana, ew ê jî bi min re bigirîna.

Ey hevalno, ji yê sax re bibêjin, ew nikare bizane  
ka çi di dilê kovandarê evînê de ye.

Naxwazim basa jana xwe ji saxan re bikim  
lê tenê ji gorî û qurbanên heman êşê re.

Jixwe ye basa stêng û zirkêtkan ji wan re bikî  
yê stêng û zirkêtkan pê venedabe.

Ta tu jî nekevî derdê min,

jana min ji te re tenê wek çîrokek kevn e.

Nabe derdê min û derdê kesek din bîn berhevdan:

121

ya wî xwê li kefa destê ye, ya min xwê li ser birînê ye.

21. Xortek, ji dil û canê xwe pak û bijûn,

bi evîndara xwe ya bedew re di belemeyekê de bû.

Min xwendiyê ku ew ji belemeyê ketin avê.

Dema belemewan destê xwe da yê xort  
daku wî xelas bike û nehêle bimire,  
yê xort li ber pêl û fûran bangî wî kir:  
"Min bihêle û evîndara min xelas bike!"  
Dema wî wiha got, dinya li ber şêlî bû  
û hat bihîst ku wî wiha got:  
"Guh nede gotinên wî bêkêrî  
yê di gava pêdivî de li hevalê xwe xwedî dernakeve."  
A wiha ne yên bi rastî evîndar;  
guh bide vê çîroka rast daku jê fêr bibî  
çimkî çawan bexdadî erebiya xwe dizanin,  
wisn Se'dî jî rê û rêçik evînê dinase.

122

Heke te evîndarek hebe, dilê xwe bide wê  
û guh nede gotinên xelkê!  
Heke Mecnûnê Leylê jî vebijiya,  
wî jî dê ji vê pirtûkê çîrokên evînê bixwendana.

VI

2. Kalepîrekî bas kir ku bi keçek ciwan re zewiciye. Mêrik mala xwe bi gulan xemilandibû û bi keçikê re rûdinişt û dilê xwe û çavên xwe gorî û qurbanî wê kiribûn. Bi şev û roj xew bi çavên wî nediket hindî ji wê re diaxivî û henek digotin daku keçik wî binase û jê netirse. Şevê wî gotibû: "Şensê te baş e û felek li te bişiriye û bişkuriye ku kalepîrek bûye nesîbê te ku têgihiştî, dinyadîtî û aram e û tamî sarmayê û germiyê kiriye û hem qencî û hem jî xerabî dîtiye. Loma ew dizane ka bihevrejîn çawan e û dizane daxwazên evînê bi cî bîne. Ew dilovan û birehm e, camêr û zimanxweş e.

Tenê ku bikarim, ez ê bikevim dilê te,  
û heke min bixeyidînê jî, ez ê dilê te nehêlim.  
Heke wek papaxan bixwazî tenê şîrîniyan bixwî,  
ez ê giyana xwe ya hingivînê jî bikim xwarin ji bo te.  
Tu neketî destê xortek sosret, bêhiş û sozsivik ku herdem dil li kesek din  
e, her şevê xwe li derekê diborîne û her gavekê ji kesekê hez dike.  
Ne bendewarî sadîqiya bilbil be  
çimkî ew hertim difirre ser gulek nû  
123

berevajî kalepîrê bi hişmendî û aqildarî, ne bi qoçên dij-aqilên  
xortaniyê, tev digere.  
Dostek ji xwe baştir bibîne û ji dest nede  
çimkî bi yek mîna xwe re giyana te dê vala derbas bibe."  
Yê kalepîr got: "Min gelek gotinên wiha jê re gotibûn û bawer dikir ku  
min dilê bijandiyê xwe û ew kiriye nêçîra xwe lê wê axînek têrjan kişand  
û got: "Hemû gotinên te di mêzîn û teraziyê de ji vê gotina diya min  
siviktir in: 'Ji keçan re tîrê jî ji kalepîran baştir in'."  
Dema keçikê tişteke nermîçok  
yê mîna lêva jêrîn a rojîgir şorrbûyî û daketî  
dît, wê got: "ez rebenê mirime û efsûne  
tenê kêrî yê raketî û nivistî tîn!"  
Mala jin ne razîkirî ji ber mêrê xwe radibe  
tijî gengeşe û şerrenîxa hertimê ye.  
Heke kalepîr bi xwe tenê bi gopal bikare rabibe,  
dê çawan gopalê wî bi xwe rabibe?  
Bi kurtî, lihevhatin di navbera wan de çênebû û ew ji hev cuda bûn.  
Keçik bi xortek bînteng, enirî, berîkvala û edetxerab re zewicî û ji destê

wî gelekî zor û tehdâ, nexweşî û bela dîtin. Lê dîsan jî wê spasiya Yezdan dikir: "Pesna û sena bû Yezdan ku ji wê ezaba dojhê xelas bûm û ketim vê bextiyariya biheştîn!"

Tevî hemû bîntengî û zordariya te jî,  
ez nîrê te hildigirim çimkî tu bedew î.  
Xweştir e bi te re di Dojhê de bikijkijim,  
ne bi kesek din re bikevim Biheştê.

124

Bîna sîran ji devê yek bedew  
xweştir e ji sorgula di destê yek kirêt de.

3. Li Diyarbekirê ez mêvanê kalepîrekî bûm. Ew zengîn û bavê kurek keşxe\* bû. Wî şevê çîroka xwe ji min re got: "Min di hemû jiyana xwe de min ji bilî vî ti kurên din tine bûne. Li van deveran geliyek heye. Li wî gelî darek pîroz heye ku xelkê vir diçe ber wê darê dua û lavayan ji Yezdan dike. Min bêhejmar şev û roj li binê wê darê bang hawarî Xwedê kir ku kurekî dibe min."

Hingê min bihîst ku kurê wî dibêje: "Xwezî min bizaniya ka ew dar li kû ye. Ez ê biçûma wir û min ê dua bikirana daku Xwedê riha vî pîretewtî\* bîstana."

Bavo bi kêfxweşî digot: "Kurê min jîr e."

Kurik ji tehn: "Xwedê-nehiştî mejîreş e!"

Sal û dem borîn

û tu neçûyî ser gorra bavê xwe.

Te çi qencî li bavê xwe kiriye

daku heman qencyê ji kurê bipê?

---

JÊRENOT



1.8. Hormiz: li vir armanc ji padişahêk sasaniyan e.

5.19. Angorî Qur'anê (12:31) mêvanên Zuleyxayê wisan bi dîtina bedewiya

Yûsif mat man ku, li şûna pirteqalan spî bikin, bi bêdestî destên xwe birrîn.

5.19. Qur'an 12:32

125

6.3. keşxe: qeşeng, kur an zelumê xweşik û bedew

6.3. Armanca kurik bi "vî pîretewtî" bavê wî bi xwe ye.

126

Parçeyek ji

Kuncik

Fyodor Dostoyevskî

IV

"Hah-haa! Dawiyê tu dê zewqê ta di didanêşiyê de jî bibîn!" hûn ê bi kenkî bibêjin.

Îcar çi? Carekê hemû mehê didanên min diêşîn loma ez dizanim ku zewq di didanêşiyê de jî heye. Hingê bêguman bêdeng ezyet nayê kişandin lê mirov dinale lê ev nalîn ne yên dilpakiyê ne, ew ên ziyaxwaziyê ne û jixwe hemû nehîni û razdarî di ziyaxwaziyê de ye. Tam ew nalîn neynika zewqa mirovê ezyetkêş û kovandar e; heke wî hest bi zewqê nekiriya, ew dê nenaliya. Ev mînakek baş e, rêzdarno, û dixwazim wê ji nêzvetir zelal bikim. Pêşîn, bêwatetiya hemû xweagahiya jana we kêma dike, hemû qanûngoriya xwezayê, ku hûn qet guh nadinê lê dîsan jî ji ber bi kul û derd in tevî ku xwerist bi xwe ji ber nanale, jê diyar dibe. Xwiya dibe ku we ti dijmin nîn in lê dîsan jî hûn janê dikişînin; ku hûn û her celeb

bijîşk û nojdar koleyên didanan in; ku heke kesek bixwaze, jana we dê xelas bibe lê heke nexwaze, didanêşiya we dikare sê mehan jî bidome, û dawiyê jî, ku heke hûn dîsan jî serê xwe li ber netewînin û dijî wê yekê rabibin, hûn dikarin ji bo xemrevandina xwe tenê qamçiyên li xwe bidin û mist û kulman li dîwaran bidin ta xwîn jê bê lê ne tişteke din. Belê, tam ji van birînên sera û binasên hoyek nenas, ji vê qerfê zewqek serekaniya xwe digire ku carinan digihe gupik û lûtkeya çêj û taman. Tika ji we dikim, rêzdar, carinan guh bidin mirovê şaristanî yê sed sala me dema didanêşî lê ye. Hingê guh bidinê dema êşê dusê rojan vekişandiyê ku êdî mîna roja pêşîn nanale ango nalîna wî ne ji ber hindê ye ku didanên wî diêşin û ne wek cotkar û gundiyan dinale lê wek mirovek pêşketî, mirovê

127  
şaristaniya ewropî ketî canî, wek wî mirovî yê "ji erdê û ji nav rêzên kûr ên gel hilketî", wek niha tê gotin. Gazin û nalînên wî dibin acizker, dibin zalim î erjeng û bi şev û roj didomin. Û jixwe ew bi xwe jî dizane ku bi gilî gazinan, bi nalîn û kalînan ti sûde û mifayekê ji xwe re naîne. Ew dizane ku bêwec û bêencam xwe û yê din diwestîne û aciz dike; ew dizane ku cemawerê ew li pêş bi hemû şiyana xwe tê dikoşe û hemû malbata wî hê niha zivêrbûyî û bêzarane lê guhdarî dikin, ku ew qet jî ji wî bawer nakin û difikirin ku xwezî ew li derek din, bi awayek sadetir, kêmtir ji qesta û plankirî binaliya, û ku tenê ew ji dilxwaziya xwe acizker û zorker e. Belê, di hemû vê hestkirina bi şermê de zewqa berz heye. "Ez ê we ezyet bidim", ew dirame, "ez ê dilê we biperitînim û nehêlim ku yek jî bi aramî ji xwe re binive û rabikeve. Ango ranezên, her bîsk û saniyeyê jê haydar bin û hest

pê bikin ku didanên min diêşin. Ez êdî hew ew gernas û egîd im ku min berê dixwest xwe pê bidim pêş; niha tenê heyokek reben û perîşan im. Lê ma çî ye! Pîr dilşad im ku hûn niha di min re dibînin. Ma li we xweş

nayê guhdariya gilî û gazinên min bikin? A ew heqê we ye, ez ê aniha rewşa we hê jî kembaxtir bikim..." Ma hûn hê jî fam nakin, xwendevanên min ên hêja? Na, dixwiye ku divê hê seqbêrtir bê zelalkirin, divê mirov di xwevekolandinê de hê jî dûvedirêjtir biçe daku bikare di hemû aliyên wê lezetê bigihe. Hûn dikenin? De ka çi xweşî ye! Li gor we, rêzdarî, henekên min nelirê, asê û nezela in û xwebawerî di wan de nîn e. Lê sedem ew e ku qet nirxek min li nik min tine ye. Ma kesek nav û hindirê xwe vebikole dê bikare qedir û qîmeta xwe li hember xwe hebe?

128

KEŞÎŞÊ REŞ

Anton Çexov

I

Zanyar Andrey Vasîlyîç Kovrîn hest pê kir ku westiyaye, demarên wî jî nesax bûn. Wî dest pê nekir û matî ji xwe nekir lê di nav suhbetekê re, gava bi şûşeya meyê re bû, ji hevalê xwe yê nojdar re basa vê yekê kir, û vî hevalî jî ew şîret kir ku bila bihar û havînekê li derveyî bajar derbas bike. Di heman deman de wisan qewimî ku nameyek dirêj ji Tanya Pesotskayayê hat û tê de ew vexwendî Borîsovkayê hat kirin. Û Kovrîn fikirî ku bi rastî jî divê ji vê geremolîyê derbikeve û hewayek hên bikişîne. Pêşî - hingê meha banemerê bû - wî rêwîtiyek bir gundê xwe Kovrînkayê û li wir sê hefte di tenêtiyê de borandin; paşî ku rê û rêçik xweştir bûn, ew bi erebeya hesp çû nik çavdêr û perwerdekerê xwe yê berê Pesotskî, ku baxçevanek li Rusyayê bi berfireyî tê nasîn e. Ji Kovrînkayê ta Borîsovkayê, ciyê malbata Pesotskiyan, ne ji heftê verstan (pîvek rusî ya dirêjiyê ye, 1 km û 70m ye -çapa kurdî) dirêjtir bû, û rêwîti li ser rêyên nerm ên biharê, di erebeya aram de ya bi pergala lêhatî raxistî zewqek rastîn bû.

Xaniyê Pesotskiyan bi stûn û serê şêrên li ber deriyan pirr mezin bû lê

hinek ji lebxê û moleya dîwaran jê werîbû; xizmetkarê cilfrak li ber serderiyê xanî bû. Baxçeyê kevn, yê tarî û tund dixwiya û yê bi stîla îngilîzî nexşekirî, bi qasî kîlometreyekê pan bû û ji ber xanî digiha berava bekreyî ya qinc ya çem; li wir darên çamê şên dibûn ku rîşên wan ji bin axê derdiketin û dişibîn lepên axme û şerpeze yên lawiran; li jêr av xembar diteyisî, dengê nalîna darkokeyan dihat, û li wir rewş herdem wisan bû ku te dikarî rûbinî û ger bixwazî sirod û helbestan bihûnî. Li aliyê din, li nêzî xanî bi xwe, li nav baxçe û nav cinînê, ku bi şitilên xwe

129

ve bi qasî sî hektaran fire bû, li hewayê ne xweş jî hertim xweşik û dilhebîn bû. Sorgul û sosinên ew qas sosret, gulên kamelya, hind laleyên pirr-reng ji yên sîsspî ta yên ripîreş, bi kurtî, ew dewlemendiya gulên li baxçeyê Pesotskiyan, Kovrîn ti caran li ti derek din nedîtibû. Biharê hê ji nû serê xwe rakiribû û mişetî û pirriya gulan hê veşartî bû lê tenê ew gul, ên ku li aliyên bersifk û dîwaran bişkivîbûn û li hin deran di nav rûniştekan re serê hildabûn, jî bi tena serê xwe bes bûn û têra hindê dikirin ku yê gerrek biharê di nav wan re bike, hest pê bike ku di nav reng û xemla ewreng û muhteşem a mîrnişîna gulan de ye, bi taybetî jî li dema berbangên spêdeyan gava ku xunav li ser her pel û belga wan diteyisî.

Pişka neqşandî ya baxçe, ku Pesotskî bi xwe ew beş wek bêwecî dinavand, carinan di Kovrîn de hestên çîrokane yên serdema zaroktiyê şiyar dikirin. Ax çi heyberên sosret, kirêtiya kubar, derewderxistina xwezayê li wir hebû! Li wir rêçikên darfêkiyan, darhirmî, ya mîna spîndarek pîramîdî dirêj, gûzên mîna gogan, darsêvek şibî sîwaneyan û ta jimareya 1862 - ango sala Pesotskî dest bi baxçevaniyê kir - ya ji darhilûkan çêkirî hebûn. Li wir darikên biçûk î zirav, ên ku kok û qurmên wan rast û xurt bûn,

diketin ber çavên mirov lê ta mirov nêztirî wan nebûya û seqbêrtir çavdêriya wan nekira, dê tê dernexista ku ew hilûtirşik û kişmiş bûn. Lê tiştê herî zêde li nav baxçe mirov kêfxweş dikir, tevger û livbariya herdemî bû. Ji sîqleya spêdeyê ta derengiya êvarê karker bi destgere (ereboka destan), tevrik û mesînên avê di destan de mîna mêriyan û gêrikan dixebitîn.

Kovrîn êvarê, piştî rêwîtiya neh saetan, giha cem Pesotskiyan. Li wir wî Tanya û bavê wê Yigor Semyonîç ên herdu pirr dilbitirs dîtin. Esmanê sayî û stêrîn û hewapîvek nîşanên pêşbînîkirina spêdeyek qeşemî bûn lê baxçevan Îvan Karlîç li bajar bû û kesek tine bû ku ew baweriya xwe pê bînin. Li ser sifreya şîvê tenak mijara suhbetê qeşema spêdeyê bû, û

130

biryar hat girtin ku Tanya dê ranekeve daku piştî saet duwanzdehê şevê gerrekê li nav baxçe bike daku misoger bike ku her tişt baş e, û Yigor Semyonîç jî li dorên saet sêyî şevê yan zûtir rabibe û heman tiştî piştrast bike.

Hemû wê êvarê Kovrîn bi Tanyayê re rûnişt û piştî nîvşevê li gel wê çû nav baxçe. Hewa sar bû. Hê li hewş û asîtanê bîna dûkêlê şewatê difirrî. Li nav cinîna mezin, a ku dihat gotin ku ya bazarganiyê ye û ji Yigor Semyonîç re salane bi qasî hezar dahatin dianîn, dûxanek reş, tîr û dijwar xwe berdabû ser zeviyan û ew hezar ruble ji penceyên qeşemê diparastin. Dar li rêz û sazûmanek çargoşeyî û lepzîneyî, li ser xîçên rast û birêkûpêk, mîna leşker li bere û eniyê hatibûn çandin û vê pergala pirr zêde û pedantîk û herwiha wê yekê ku hemû dar bi qasî hev mezin bûn û kok û gupikên wan tam mîna hev bûn, dîmena baxçe li wir pirr yeknesak (monoton) û ta diltengker dixwiya. Kovrîn û Tanya di ber diraxe û komgehên dûkêlbar, ku ji rîxê, kayê û her celeb bermayîyan hatibûn

berhevkin, re diborîn û carinan pêrgî hin karkeran dihatin ku di nav morana dûkêl re dişibîn sîber û sîtavkan. Tenê dargilyaz û darhilûk û herwiha çend celebên sêvan bişkivîbûn lê hemû baxçe di nav dûkêl re mabû û ta ew negihan rasta komşitilan, Kovrîn nedikarî bi hemû gewriya xwe nefesê bikişîne û berbide.

- Hê dema zarok bûm, li vir dibênijîm, wî milên xwe hejnadin û got, - lê niha jî hê nizamî ka çawa dûkêl dê rê li ber qeşemê bigire.

- Eger ewr tine bin, dûkêl şûna wan digire..., Tanyayê bersivand.

- Çima ewr pêdivî ne?

- Li hewayê ewrîn û mijîn qeşem nîn e.

- A welle rast dibêjî!

131

Ew kenî û destê xwe avêt ê keçikê. Rûyê Tanyayê yê pan, pirr jidil û sarmagir bi birûyên reş î tenik re, bi pistokên rakirî yên saqo re ku nedihîştin ew serê xwe bi serbestî bilivîne, bi hemû hebûna xwe, bi bejnbiçûkiya xwe, lawazî û narîniya xwe, bi dawa xwe ya ji ber baranê hildayî pirr bala Kovrîn dikişand.

- Xwedêyo, ew mezin bûye jî, Kovrîn got. - Dema ez cara berî vê, berî pênc salan, ji vir çûm, hûn hê zarok bûn. Hûn ew qas zirav, lingdirêj, pirçhilû bûn û we etek û tenoreyên kurt li xwe dikirin, û min henek bi we dikirin ku hûn quling in... Lê ax ka sal û dem çî dikin!

- Erê, pênc sal! Tanyayê axîn kişand. - Pirr av piştî hingê herikiye. De bibêjin, Andryuşa, - wê bi dilgeşî li Kovrîn dinerî û domand, - bi rastgoyî bibêjin, ma hûn ji me biyanî bûne? Lê çima ez viya ji we dipirsim? Hûn mêr in, jiyana xwe ya balkêş û rengîn diborînin, hûn kesatiyek mezin in... Biyanîbûn tiştek pirr xwezayî ye! Lê çawa be jî bila bibe lê hêvî dikim ku hûn me jî ji xwe bihesibînin. Mafê me ji bo hindê heye.

- Jixwe ez we jî ji xwe dihesibînîm, Tanya.

- Bi sond?

- Bi sond.

- Belkî hûn diheyirin ka çima ew qas wêneyên we li cem me hene. Hûn dizanin ku bavê min we pirr nirx bilind dibîne. Carinan ji min re wer dixwiye ku ew ji min zêdetir ji we hez dike. Ew bi we ser bilind e. Hûn kesek têgihîştî, mirovek ne ji rêzê ne, we pîşeyek wurşedar û serketî hebûye, û bavo li ser wê baweriyê ye ku hûn ew qas kesek bibandor in ji ber ku wî hûn xweyî kirine. Ez naxwazim rêya wî bigirim ku wisan nerame. Bihêlin bila wisan bifikire.

132

Êdî spêde zelal dibû; wî bi hindê aga ji spêdebûnê bû ku gupikên daran û gulolikên dûkêl baştir ji hev cuda dihatin sihirandin û dîtin. Bilbil distrîn û û awazên sûskan ji nav zeviyan digihan nik wan.

- Lê niha dema raketinê ye, Tanyayê got. - Sar e jî, wê destê xwe xist bin kefşê Kovrîn. - Spas, Andryuşa, ku hûn hatin. Nas û lêzimên me li vir kêr in û yên heyî jî balnekêş in. Me tenê baxçe heye, baxçe û baxçe û baxçe - ti tiştekin ne. Qurmek darê, nîvqurmek, ew kenî, - gulegiyayên sêv, hirmî û hilûkan; kezaxtin, adekirin, helboqkirin... Hemû, tev jiyana me di ber vî baxçeyî de çûye, ez ji bilî sêv û hirmiyên ticaran di jiyana xwe de tiştekin nabînim. Bêguman ev kar jî baş û biwec e lê carinan dil dixwaze tiştine din jî. Bîra min tê, gava hûn ji bo dema azane û tatîlê yan wek din dihatin, serdanser di hemû malê de kêfxweşî û ronahiyek geş dibû, tam mîna ku qumaşê mobilya û awîzeyan ji ser hatibe vekirin û xemla wan xwiya bike. Ez hingê biçûk bûm lê dîsan jî tê bîra min. Ew dirêj û bi diltenikî peyivî. Di cî de ket serê Kovrîn ku ew dikare bi herikîna vê havînê re dilê wî bikeve vê afirandîya narîn, lawaz û

zimanxweş, heyranî wê bibe û jê hez bike - di rewşa wan de dê ev yek hem gengaz û hem jî xwezayî bûya! Vê ramanê ew hem diponijand û hem jî ew dikenand; wî xwe tewand ber rûyê xembar û xweşkok ê keçikê û strî:

Onegîn, veşartinê naxwazim. Ji Tatyanayê bi şeydayî hez dikim... Dema ew vegeerîn hindir, Yigor Semyonîç şiyar bûbû jî. Xewa Kovrîn nedihat, ew bi mêrik re kûrî suhbetan bû û li gel wî vegeerî nav baxçe. Yigor Semyonîç kesek bejnmezîn, milpan, zikqelew bû û herwiha nedikarî baş nefesê bikişîne lê dîsan jî herdem ew qas bi lez dimeşî ku mirov pê re nedigihê. Rûyê wî bêsinor xemxwar bû, wî bênavbirr xwe dilezand derekê mîna ku dibê qey ew deqeyekê jî dereng bibe, her tişt dê di ber avê de biçê.

133

- Tu dibînî, têlîkê min, çima wiha ye... wî dest pê kir û rawestî daku hinekî bîna xwe vebike. - Li rûyê erdê, ku tu bi xwe jî dibînî, qeşem heye lê gava hewapîvekê rabikî rastî hemêza xwe, tu ê bibînî ku li wir hewa germ e... Çima wiha ye?

- Bi sond ez nizanim, Kovrîn bi kenkî got.

- Hm... Mirov nikare her tiştî bizane, bêguman na... Mejî çi qas fire be jî, ciyê her tiştî nake... Jixwe tu herî zêde bi felsefeyê re mijûl î yan na?

- Belê. Ez derûnnasiyê (psîkolojiyê) dixwînim lê hewesa min li ser felsefeyê xurt e.

- Ê dilê te jê reş nabe?

- Berevajî, ew hemû jiyana min e.

- De Xwedê hez bike... Yigor Semyonîç got û bi kûrponijî riyên xwe yê spîbûyî perixandin. - Xwedê hez bike... Ez bi te kêfxweş im, gelekî kêfxweş im, têlîkê min...



Di cî de ew bêdeng bû û guhên xwe dan ser hawirdor, rûyê wî guherî tirsnakeyê, ew bezî aliyê din û zû di nav ewrên moranî yê dûkêl de wenda bû.

- Kê hesp bi darsêvê ve girê daye? dengê wî yê bêhêvî, qîrîna wî ya dilperritîn hat. - Kî cinawirî ev hesp bi sêvê ve girê daye? Ax Xwedê, Xwedêyo! Her tişt hatiye pûçkirin, têkdan, teribandin, hincirandin, hilweşandin

û

ruxandin!

Baxçe

hatiye

talankirin!

Baxçe

hatiye

wêrankirin!

Dema ew vegeerî nik Kovrîn, nîşana betilîn, westîn û xeyidînê li ser rûyê wî bû.

134

- Ma dikarî çî li wan bikî, li vî xelkê xezeblêbarî? wî bi dengê zîz û melûl got û destên xwe li ba kirin. - Stepka bi şev rîx dikêşî û hesp bi darsêvê ve girê da. Hevsar wisan bi darê ve şidand, wî xwedêhiştî, ku qalikê darê ji sê ciyan xewixiyê û jê vebûye. Çî ehmeq û serserî! Ez jê re diaxivim lê ew mîna qurmekî radiweste û çavên xwe dineqîne. Daliqandin jî ji bo kesên mîna wî cezayek gelekî sivik e!

Piştî ku hinekî hedinî û arimî, wî Kovrîn hemêzand û çû serê wî.

- De Xwedê hez bike, Xwedê hez bike..., ew minminî. - Pîrr kêfxweş im ku tu hatî. Bêwêne kêfxweş... Spas.

Paşî ew bi lezgînî û bi rûyê mîna herdem xemxwar çû li dor baxçe bizivire û hemû sera, berbanên ji bo şitilan, penagehên zibilê lêreşandinê û du baxçeyên mêşên hingivîn, ku wî bi sosretiya sedsalê dinavandin, nîşanî şagirt û mezinkiriyê xwe yê berê da.

Dema ew hê li gerra xwe bûn, roj hilhat û baxçe bi zelalî ron kir. Germ bû. Ku Kovrîn hay jê bû rojek bedew, kêfxweş û dirêj dest pê dike, hat bîra wî ku niha hê destpêka gulanê ye û hemû havîn, wiha bedew, şad û dirêj li benda wî ye û hestek tijî hêvî û ronahî, mîna hestên hingê gava ew di zaroktiya xwe de li van deran dibizirî, ket dilê wî. Ê niha wî bi xwe mêrik hemêzand û bi nermî maçand. Herdu bi dilxweşî ketin hindir û dest bi vexwarina çayê ji fincanên kevndemî yê porselenî bi qeymax û gustîlkadeyên rûnî re kirin. Ê van tiştikên biçûk jî zaroktî û xortaniya Kovrîn dianîn bîrê. Hemdemiya bedew û bîranên raboriyê têkil dibûn; wan rewşek tengezar lê dilhebîn dixist dilê wî.

Ew li benda şiyarbûna Tanyayê ma, bi wê re qawe vexwar, bîskeke li ser gerrî, paşî çû odeya xwe û rûnişt ber maseya kar. Wî bi seqbêrî dixwend, not û têtînî digirtin, kêman serê xwe radikir daku li paceyên vekirî û gulên di guldankan de, yê terr û ji ber xunavê hê şil, binere, dîsan serê

135

xwe şorr bike ser pirtûkê, û wî hest pê kir ku her demarê di wî de pêl radikirin û ji ber zewqê direqisî.

II

Wî li derveyî bajar jî jiyaneke wisan nearam û serxwer domand. Wî pîrr dixwend û dinivîsî, xwe fêrî zimanê îtalî dikir û dema li gerrînê jî bûya, difikirî ku xwezî zû vebigere ber karê xwe. Ew qas kêman radiket ku her kes dihêbitand: heke bi bêdilî xwe rojê nîv saetê jî binivista, êdî hemû şevê xew bi çavan nediket lê dîsan jî piştî şeva bêxew wî xwe kêfxweş û zînde

dihesand mîna ku qet tişteq neqewimîbe.

Ew pirr dipeyvî, mey vedixwar û cixarên bihagiran dikişandin. Pirrî caran, hema bêje her roj, keçxanimên dercîranan dihatin mala Pesotskiyan û bi Tanyayê re li piyanoyê dixistin û distrîn; carinan zelamek xort jî dihat û pirr baş keman dijenand. Kovrîn bi çavbirçîtî li muzîkê û stranan guhdarî dikir û ji vê guhdariyê wisan diwestî ku çavên wî diketin ser hev û serê wî bi aliyekî de şorr dibû.

Carekê piştî çayvexwarina êvarî ew li balkon û şaneşînê rûniştibû û dixwend. Tanya - soprano - û keçxanimêk cîran - kontra-alt - û yê xort jî bi kemana xwe wê demê li saloneya mêvanan rahênana serenada navdar a Brag dikirin. Kovrîn guhdarî gotinan dikir - ew rusî bûn - lê nedikarî xwe bigihîne naveroka wan û tê bigihe. Dema dawiya dawîn dev ji pirtûkê berda û kûrî guhdarkirinê bû, ew tê ghişt: keçek dîn û şêt bi şevê hin dengên razdar û sirr ji nav baxçe dibihîstin, dengên ew qas bedew û seyr bûn ku wê ew wek ahengek pîroz hesabandin ku ji aliyê me yên mirbar de nayê têgihîn loma dîsan difirrin esmanan. Çavên Kovrîn hêdî-hêdî ketin ser hev. Ew rabû ser xwe, westiyayî, pêşî li saloneya mêvanan û paşî li

odeyên din jî meşî. Dema rahênana û xwehînkariya stranê bi dawî hat, wî destê xwe avêt bin keşê Tanyayê û ew bir balkonê.

- Îro ji spêdeyê ve efsaneyekê ez ramandime, wî got. - Nayê bîra min ka min ew ji derekê xwendiyê yan jî bihîstiyê lê ev efsane gelekî watedar e, ji

hemû yên din awarte ye. Dikarim ji wê yekê dest pê bikim ku zelalî ne para wê ye. Hezar salan berî niha keşîşek kincên reş lê li çolistanek Suriyeyê yan Erebiştanê digerî... Çend mîlan ji ciyê ew digerî wê de masîgiran dît ku keşîşek din ê bi kincên reş hêdîka li ser rûyê

deryaçeyekê dimeşî. Ew keşîşê din leylanok bû. Hemû zagonên dîtinnasî û optîkayê li aliyekî bihêlin çimkî wer dixwiye ku ew bala vê efsaneyê jî nakişînin, û guhdariya vê bikin. Ji leylanê leylanek din çêbû, yek din û yek din ta ku şekilê ê keşîş bêdawî ji qatek hewa digiha ya din. Carinan ew li Efrîqayê, carinan li Îspanyayê, carinan li Hindistanê û carinan jî li Rojhilata Dûr dihat dîtin... Dawiya dawîn ew ji atmosfera vê dinyayê der û dûr ket û niha li gor serê xwe di gerdûnê de diçe û tê bê ku bi ti awayî bikeve nav mercên wisan ku bikare biruxe. Dibe ku ew niha li Merîxê yan jî li stêrek ji komstêrên Xaça Başûr bikare bê dîtin. Lê kakila vê efsaneyê, heval, ew e ku tam piştî hezar salan ku keşîş li çolistanê digeri, leylan dê dîsan bikeve nav biraha cîhana me û xwe nîşanî mirovan bide, û tê gotin ku ev hezar sal li ber xelasbûnê ne. Li gor vê efsaneyê divê em çavkirîyên keşîş bin ku heke ne îro, sibê ew ê xwiya bibe.

- Leylanek çi seyr e, Tanyayê, ku efsane ne bi dilî bû, got.

- Lê sosrettirîn tişt ew e, Kovrîn xwe kenand, - ku qet nayê bîra min ka ev efsane ji kû ketiye serê min. Ma min ew li derekê xwendiyê? Yan jî bihîstiyê? Yan jî belkî min keşîş di xewna xwe de dîtibe? Sond dixwim ku nayê bîra min. Lê ev efsane min difikirîne. Îro hemû roja min bi wê ve boriye.

137

Piştî ku wî Tanya berda nik mêvanan, ew bi xwe di nav ponij û ramanên xwe de di nav guldankan re ji xanî derket. Ji gulan, ên ku hê nû hatibûn avdan, bînek axa şil û bicoş difûrî. Li hindir dîsan dest bi strînê hatibû kirin, û dengê kemanê ji dûr ve dişibî yê mirovan. Wî fikirên xwe zivêr kirin daku bîne bîra xwe ka ew efsane ji kû bihîstibû yan jî ew xwendibû û pê re berê xwe da dal û rêlê û bêyî agayiya xwe hat ber çem.

Bi dirêjiya rêçikê ve, ya ku bi kenarika asê û kêrreyî ve ber jêr de

xwarovîç dibû û di ber gıyasilkên ripîrût re derbas dibû, ew daket beravê û bû belaya serê hin firindeyên darkoke û du werdek tirsandin. Tîrêjên dawîn ên roja li ber avabûnê li hin deran di ber gupikên darên çamî yê reşbar re dibiriqîn lê êvarê xwe bi tamamî berdabû ser rûyê çem. Kovrîn bi pira pelingî ve xwe gihand aliyê din ê beravê. Li pêş wî zeviyek berfire ya bi şilêlek (genimê çewder/tarîgan) nû yê hê gulînedayî niximandî hebû.

Ne jîngehek û ne jî benderuhek li ti deran dihat dîtin, û wer dixwiya ku rêçik, heke mirov li pey biçûya, dê bigihaya wî ciyê razdar û nepenî ku berî bîskeke roj lê ava bûbû û hengura êvarê bi ewrengî û mirêsî lê diçirisî.

- Ax ev der çi qas vekirî, azad û bêdeng e! Kovrîn, dema bi rêçikê ve dimeşî, difikirî.

- Û wer dixwiye mîna ku hemû cîhan li min dinere, bêdeng bûbe û li bendê be ku ez tê bigihim...

Di heman demê şilêl pêl dan, û bayê sivik ê êvaran xwe bi nermî li serê wî yê kol da. Piştî kêlîkekê bagerokek din, a pîrr bihêztir hat, şilêl xijxijî, û ji paş ve hurmîna xirş a darkajan bihîzî. Kovrîn hêbetmayî rawestî. Li qeraxa esman peykelek dirêj î reş wek barov û bagerê ji erdê hilket jor. Serxetên wî şêlî û nezalal bûn lê hê di bîska pêşîn de dikarîbû bê sihirandin ku ew li ciyê xwe ranediwestî û bi lezgîniyek erjeng dilivî û ne bi ti derek din lê virde, rasterast bi cem Kovrîn de dihat, û her ku nêztir

138

dibû, wisan biçûktir û zelaltir dibû. Kovrîn xwe avêt cokê daku rê bidiyê lê hê negihabû wisan jî bike...

Keşîşê kincreş, pirçspî, birûreş û dest li ber sîngî jê çindikdayî... Lingên wî yê pêxwas ji erdê nedigirtin. Ku çend gavekan ji Kovrîn borî, ew li ser

milê xwe zivirî ku li Kovrîn binere, serê xwe çemand û hem bi nermî û hem jî bi xasûkî û qurnazî bişirî. Lê ax rûyê wî çi qas zerik û spîçolkî, pirr spîçolkî bû! Dû re keşîş dîsan mezin bû, di ser çem re firî, bi bêdengî bi berava bekreyî ve û li hember darçaman xwe divirand û, ku xwe dawêşand nav daran, ji ber çavan wenda bû.

- De, we dît ka çi qewimî... Kovrîn minminî. - Ango efsane rast e.

Bê ku ew bide xwe ku vê diyardeya sosret ji xwe re şîrove bike, bi wê yekê kêfxweş û razî bû ku lê hat ew ne tenê keşîş ew qas ji nêz ve û bi zelalî lê herwiha serçavên wî jî bibîne, Kovrîn bi diltirsiyek dilhebîn ve vegeirî malê.

Xelk bi aramî li nav bax û baxçe digerrîn, li jor muzîk dijenî, - ango tenê wî keşîş dîtibû. Wî pirr ji dil hez dikir ku hemû çîrokê ji Tanyayê û Yigor Semyonîç re bibêje lê ew tê giha ku wan dê gotinên wî wek pest bihesibandina û bitirsana jî; baştir bû ku bêdeng bimîne. Ew bi dengbilindî kenî, strî, govenda masurka (govendek sêgavkî ya kokpolonî

-

çapa kurdî) reqisî, kêfa wî li cî bû; li gor hemûyan, hem mêvanan û hem jî Tanyayê, rûyê wî îro taybet bû, geş bû, diçirî û ew bi xwe jî balkêş bû.

III

Piştî şîvê, dema mêvan çûn, ew jî çû odeya xwe û xwe pal da ser genepeyê: dilê wî dixwest dîsan li ser wî keşîşî bifikire. Lê piştî delîvekê Tanya hat.

139

- Va ye, Andryuşa, nivîsarên bavo bixwînin, wê got û qeftek kaxezan û parçeyên rojnameyan raberî wî kirin. - Nivîsarên baş in. Ew pirr xweş dinivîse.

- Herê çi xweşiya wan heye! Yigor Semyonîçê li pey Tanyayê hatî got û bi

zorkî xwe kenand; wî şerm dikir. - Ji wê bawer neke, ji camêriya xwe, wan nexwîne! Lê heke dixwazî ku xewa te bê, dibe ku baş be wan bixwînî: ew ji bo xewê dermanê herî baş in.

- Bi min ew nivîsarên bêpayan in, Tanyayê ji dil got. - Bixwînin, Andryuşa, û bavo kişkiş bikin ku zêdetir binivîse. Jixwe wî dikarîbû pirtûkek temam a baxçevaniyê binivîsiya.

Yigor Semyonîç bi coşî kenî, sorikî û bi şermokî minminî. Lê dawiyê radest bû:

- Madem wiha ye, pêşî van kurtenivîsên Gosche yên bi rusî bixwîne, ew minminî û çavek li kaxezan gerand. - Wek din tu dê nikaribî nasyarî mijarê bibî. Ji berî ku dest bi xwendina îtîrazên min bikî, divê tu bizanî ka ew li hember çî ne. Wek din... wek din her tişt bêwate û bênaverok e. Û jixwe dema raketinê ye jî.

Tanya derket. Yigor Semyonîç rûnişt ser qenepeyê li rex Kovrîn û axînek kûr kişand.

- Belê, têlîkê min... wî piştî kêlîkek bêdengiyê dest pê kir. - Ez li vir nivîsaran li hev tînim, beşdarî pêşangehan dibim û medalyeyan bi dest dixim... Pesotskî, tê gotin, sêvên bi qasî seran hene, û Pesotskî, xelk dibêje, bi baxçeyê xwe maldarî û dewlemendiyek peyda kiriye. Bi kurtî bê gotin, "Kotşubey xanedan û xwedîşoret e". Lê dikare bê pirsîn: gelo ev hemû ji bo çî ye? Baxçe bi rastî jî bêyom ye, ji hemûyan re mînak e... Ew ne tenê baxçe ye lê dezgeyek temam a xwedî wateyek dewletî ye çimkî ew,

140

em bibêjin, ew di rabûna pîşekarî û aboriya nûjen a Rusyayê de gavek e.

Lê ji bo çî ye? Mebesta wê çî ye?

- Xebat bersiva hemû vê yekê dide?

- Tiştêk din di dilê min de ye. Ez dipirsim: dema ez bimirim, dê çi bê serê baxçe? Baxçe, wek niha ku tu dibînî, mehekê jî bêyî min namîne. Razdarî û nehîniya serketinê ne di wiya de ku baxçe mezin e û kedkar pirr in lê di wê yekê de ye ku ez ji karê xwe hez dikim - tê digihî? - belkî ji xwe jî zêdetir ji vî karê hez dikim. Li min binere: her tiştî bi xwe dikim. Ji sîqlespêdeyê ta derengî şevê bi xwe dixebitim. Kezaxtinê ez bi xwe dikim, bi xwe dibirim, bi xwe şitilan diçikilînim û dişitilînim, bi xwe - her tiştî bi xwe dikim. Dema alîkariya min tê kirin, çavnebar û hesûd dibim û diqehirim. Hemû razdarî di hezkirinê de ye, bi gotinek din, di bin çavdêriya xwediyê kar de ye, di destên wî de ye û di wê rewşê de ye ku heke bi mêvanî biçî derekê, hema ji bo nîv saetê jî be, dilê te rehet nabe, hişê te ne li serê te ye: herdem ditirsî, xwezî bes belayek li baxçe neqewimîbe. Pa heke ez bimirim, kî dê çavdêriya baxçe bike? Kî dê hemû karan bike? Baxçevan? Kedkar? Ew? Bihêle, ji te re bibêjim, heval: diwartirîn dijminê me ne kîvroşk, mêsûmor yan sarma lê mirovên biyanî ne.

- Ma Tanya? Kovrîn bi ken pirsî. - Jixwe nikare bê gotin ku ew ji kîvroşkan bizerartir be. Ew ji baxçe fam dike û hez dike.

- Belê, ew jê fam dike û hez dike. Heke baxçe piştî mirina min bikeve destê wê û ew bibe xwediyê vî baxçeyî, belê, bêguman tiştêk baştir nikare bê hêvîkirin. Lê pa, Xwedê me bisitirîne, heke ew zewicî? Yigor Semyonîç pistî û bi çavtîrskî li Kovrîn nerî. - De paşî hingê! Dê bizewice, zarokên wê hebin û dem nîn e li ser baxçe bihizire. Herî zêde ji hindê ditirsim ku ew bibe ya tûle û tolazekî yê ku çavnebar û hesûd be û baxçe bi kirê bide

141

bazarganên jin û pîretewt û hingê dê hê sala pêşîn her tişt di ber avê de biçê! Li vê mijara baxçevaniyê pîrek û pîretewt xezeba Xwedê ne!



Yigor Semyonîç axînek kişand û bîskekê bêdeng bû.

- Dibe ku ezperestî be, lê bi dilpakî dibêjim: naxwazim ku Tanya bizewice. Ditirsim! Gerok û felîteyek bi kemana xwe re carinan tê van deran û vingevîngê jê tîne; dizanim ku Tanya dê nebe ya wî, baş dizanim lê dîsan jî naxwazim ku ew bê ber çavên min! Pirrî caran, têlîkê min, ez kesek seyr im. Îtîraf dikim.

Yigor Semyonîç rabû ser xwe û bi nearamî li nava odeyê hat û çû; jê dixwiya ku dixwest tiştekî pirr girîng bibêje tevî ku hê hingê bisteyî (cesaret) nedikir jî.

- Ez bi şewatî ji te hez dikim û dixwazim bi dilpakî bi te re bipeyivim, - wî dawiya dawîn wêrekî da xwe û destên xwe kirin berîka xwe. - Hin pirsgirêkên nazik û hesas ez ê bixim ber çavan û tiştê difikirim, ez ê vekirî bibêjim çimkî min serê fikir û ramanên veşartî nevê. Ez ê rasteqîn bipeyivim: tu tenak kes î ku natirsim keça xwe bidimê. Tu kesek aqilmend î, xwedîdil î, tu nahêlî ku xweştivîtirîn karê min di ber avê de biçe. Ê tiştê herî girîng, mîna ku tu kurê min bî, ji te hez dikim... Ê bi te serbilind im. Heke evînek di navbera te û Tanyayê de geş bibe, ma dê çi bibe? Ez ê pirr kêfxweş û ta bextiyar jî bibûma. Vê yekê rasterast, bêyî şermkirin, wek kesek rastgo ji te re dibêjim.

Kovrîn xwe kenand. Yigor Semyonîç derî vekir ku derbikeve lê li derazînkê sekinî.

- Heke te û Tanyayê kurek hebûya, min ê ew bikira baxçevan, wî bi kûrponijî got. - Lê jixwe ev hemû xeyalkirinek vala ye... Şev baş.

142

Piştî ku Kovrîn bi tenê ma, ciyê xwe xweş kir û dest bi xwendina nivîsaran kir. Sernavê yekê "Ji çandeya qonaxa navîn", a din "Çend gotin li ser nivîsa birêz Z ya di warê çinîna baxçeyên nû", û ya sêyem "Hê piçek



Kovrîn xwendina xwe domand lê, ku di tiştêkî jî negiha, dev ji hewldanê berda. Heman azweriyê, ya ku ew li ber bandora wê masurka reqisîbû û guhdariya muzîkê kiribû, niha gelek fikir û ponij dixistin serê wî. Ew rabû ser xwe, di odeyê ve hat û çû û li ser keşîşê reş ramî. Texmînek wisan ket serî ku heke wî bi tenê ew keşîşê sosret û deresiruştî û surnatural dîtibe, ango ew nesax û dîn e û wî dilwas û waswase hene. Vê rawêj û texmîne ew tirsand lê tirs zû jê verevî.

"Heke ez sax bim û ti ziyaneke negihînim kesekî, ti tirsek ji bedgumanîyên min nîn e", ew ji xwe re fikirî, û dilê wî rehet bû. Ew rûnişt ser qenepeyê û bi destên xwe serê xwe şidand û pê ew kêfxweşiya bêpayan, a ku hemû heyîna wî dagirtibû, digirt, paşî ew dîsan hinekî hat û çû û li ber karê xwe rûnişt. Lê wan fikiran, ên ku wî ji pirtûkan dixwendin, ew razî nedikir. Wî bêriya tiştêk mezin, bêtixûb, tiştêk ecêb dikir. Di berbanga spêdeyê de wî cilên xwe ji xwe kirin û bi bêdilî xwe avêt nav nivînan: diviyabû hinekî binive jî!

Dema Kovrîn pêngavên Yigor Semyonîçê diçû nav baxçe bihîstin, wî bangî xizmetkar kir û jê mey xwest. Bi zewq çend qedehên lafitteyê vexwarin û paşî betenî hilkişand ser serê xwe; mîna ku hişmendiya wî bihele nav mijê, ew di xew çû.

#### IV

Yigor Semyonîç û Tanya pirrî caran gengeşe dikir û gotinên nexweş digotin hev.

Carekê spêdeyekê şerenîx û pevçûnek devkî di navbera wan de rû da. Tanya qorrî girî û revî odeya xwe. Ew ne hat firavîne bixwe û ne jî çayê vebixwe. Yigor Semyonîç pêşî bi pozbilindî û kubarî dihat û diçû mîna ku

bixwaze bide zanîn ku berjewendiyên dadperweriyê û sazûmana rastîn di

ser her tiştî re ne lê wî nikarî demek dirêj vê tevgera xwe rabigire û aciz bû. Bi xemgînî ew li nav baxçe li gor serê xwe dimeşî û hertim axîn dikişandin: "ax, Xwedêyo, ax, Xwedêyo!" û li ser firavînê pariyeke jî nexwar.

Dawya dawîn, mîna tawanbaran, wek kesek wijdan lê bela, derî quta û bi şermokî got:

- Tanya, Tanya?

Dengek lawaz, dengê girînê westandî lê herwiha bibiryar ji pişt derî bersiv da:

- Bela xwe ji min vekin, tika ji we dikim!

Pevçûnên malbatîyan mora xwe li hemû malê, ta li wan, ên ku li nav baxçe dixebitîn jî, kir. Kovrîn xwe noqandibû kûriya karê xwe yê balkêş lê dawiyê êdî bîna wî jî teng bû. Ji bo ku bi awayekî rewşa bi giştî kamax hinekî qenc bike, wî biryar da ku bi xwe tişteke bike û berêvarê deriyê Tanyayê quta. Derî lê hat vekirin.

- Ay-ay, ma tu qet şerm nakî! wî bi henekî dest pê kir û bi hêbetî li rûyê Tanyayê yê girîbar, sorikî û xembar nerî. - Ma ev hemû bi rastî jî wiha ji dil e? Ay-ay!

- Erê, lê xwezî we bizaniya ka ew çawa min nerehet dike! Tanyayê got, û rondik û hêsiran, ên germ, ên gulilî dest pê kirin ji çavên wê dabiwerin. - Wî wiha kiriye ku ez birizim, wê destên xwe badan û got. - Min tişteke jî jê re negotiye... tişteke tenê jî... Tenê pirsîm, ma çi wec e ku ew qas zêde kedkarên berdewam bigire madem... madem kedkar hertim dikarin bi dest bikevin.... Ev hefteyek e ku hemû wan kedkaran karek û kirinek tine bûye... Min... min tenê ev yek jê re got lê wî dest bi qîrînê kir û barek gotinên tal û rencîner, ji dil rencîner avêtin ser min. Ji bo çi?

145

- Bes e, de bes e, Kovrîn got û pirça keçikê ediland. - Ê hûn pevçûn, tu giriya û bes e. Nabe ku ew qas pitpitê bikî, bi taybetî... bi taybetî ku ew bêsinor ji te hez dike.

- Wî... wî hemû jiyana min herimandiye, Tanyayê bi kinkinî domand. - Ji bilî tajang, heqaret û bedbêjeyan gotinekê ji wî nabihîzim... Ew di vê malê de min wek nepêdivî û bêwec dihesibîne. De baş e, ew rast dibêje. Ez ê hê

sibê biçim û bikevim ciyê birûskevan û telgrafker... Û xelas...

- Na-na-na... De negirî, Tanya. Negirî, delala min... Hûn herdu bînteng in, zû hêrs dibin û herdu jî tawanbar in. Were, ez ê te aşt bikim. Kovrîn bi nermî û bibawer dipeyivî lê Tanyayê dev ji girîna xwe, libarkirin milên xwe û badana destên xwe berneda mîna ku bi rastî jî qeza û belayek mezin bi serê wê hatibe. Ax çî asan bû ku ew afirandî bê ji bo tevayiya rojekê yan jî hemû jiyana xwe xemgîn be! Dema Kovrîn Tanya aşt dikir, wî hizir dikir ku ji bilî vê keçikê û bavê wê ji hemû dinyayê bi agir jî dê kesek din tine bûya ku bi qasî van herduyan ji wî hez bikirana; heke ev herdu nebûna, wî, yê ku diya xwe û bavê xwe hê di zaroktiya xwe ya zû de ji dest dabûn, dê belkî ticaran nizanîbûya û hest pê nekiribûya ka dilnazikiya pak û ew evîna bêguman û pak, a ku tenê di navbera kesên pirr lêzim û xizmên xwînî de heye, çawa ye. Û wî hest pê kir ku demarên wî yên peritî û merezokî xwe dirêjî demarên wê keçika digirî, ya dilerizî dikirin, mîna ku çawa asin xwe dikişîne mexnetîz. Wî dê ticaran nikariya ji jinek saxlem, liserxwe û rûgeş hez bike lê wê keçika han a spîçolkî, narîn, bextreş dilê wî diheband.

Wî bi dilxwazî pirça keçikê û milên wê mizdandin, destên wê bi nermî givaştin û rondik ji çavên wê paqijandin. Dawiya dawîn Tanyayê dev ji girînê berda. Lê hê demek dirêj piştî hingê jî wê bavê xwe lome dikir, gazin ji jiyana xwe ya giran a li mala xwe dikir û ji Kovrîn lava dikir ku di

rewşa wê bigihe; lê hêdî-hêdî wê dest bi bişîrînê kir û axînek kişand ku  
146

Yezdan dilekî ew qas qayim dayiyê; dawiyê bi dengê bilind pirçe-pirç  
kenî, gote xwe rebenok û bezî derve.

Dema Kovrîn piştî bîskekê derket nav baxçe, wî dît ka çawa Yigor  
Semyonîç û Tanya mil bi mil û bi aştî û ahengî li bersifka baxçe dimeşîn  
mîna ku qet tişteq neqewimîbe; û herduyan nanê şilêlî yê xwêpêwerkirî  
dixwarin çimkî herdu jî birçî bûn.

V

Kêfxweş ji wê yekê ku di vatiniya xwe ya avakirina aştîyê de wisan baş bi  
ser ketibû, Kovrîn çû nav baxçe. Dema wî xwe dabû ser rûniştekekê û  
ketibû kûriya ponij û ramanên xwe, xilingîna hin erebeyên hespan ên  
nêz dibûn û dengê hin jinan bihîst - mêvan dihatin. Dema sîtavên êvarê  
li derve dirêj bûn, êdî ji hindirê malê dengê stranan û awazên kemanê  
dihatin guhê Kovrîn, û keşîşê reş anî bîrê. Gelo ew negengaziya optîkî û  
dîmenî niha li kîjan welatî yan kîjan gerestêrê dipirpirrî?

Hê wî hemû efsane neanîbû bîra xwe û sawêr û xeyaletê wê yê reş, ê ku  
li

nav zeviya şilêlî dîtibû, di serê xwe de ne baş nenimandibû, ku  
afirandiyek porspîbûyî û navsere yê bi kincên ji şimik ta kumik reş bi  
bêdengî, bêyî ti xişexişekê jî ji pişt çama raberî wî derket; yek serkol û  
pêxwas, yê mîna parsekan bû û ji rûyê wî yê spîçolkî, yê hema dişibî  
rûyê miriyan birûyên wî yên reş zelal dixwiyan. Ew parsek an jî hecî bi  
dostanetî serê xwe tewand û bi bêdengî hat nik rûniştekekê û rûnişt; ji nû  
hingê Kovrîn pê hesî ku ew keşîşê reş e. Bi qasî bîskekê wan li hev nerî. -  
Kovrîn matmayî û bi hêbetî, keşîş bi dilnêrmî û herwiha, mîna cara berê  
jî, hinekî bi fêlbazî, bi rûyek wisan ku "netirse, te aqilê xwe wenda

nekiriye" li hev dinerîn.

147

- Lê tu leylan î, Kovrîn dest bi axivînê kir. - Çima tu li vir î û li cî rûdinî?  
Ev yek bi efsaneyê re nakok e?

- Ferq nake, keşîş piştî bîskek gîrobûnê bersivand û li ser zivirî daku rasterast li Kovrîn binere. - Efsane, leylan û ez - hemû berhema aşop û xeyalên te yên boşbûyî ne. Ez spêle û xeyalet im.

- Ango tu nîn î?

- Çawa dixwazî, wisan bifikire, keşîş got û bi dengkêmî bişirî. - Ez di aşop û xeyalên te de me lê aşopên te jî beşek ji xweza û siruştê ne loma ez di xwezayê de jî heme.

- Rûyê te pirr kal, aqilmend û herî zêde jî têgihîştî ye, tam mîna ku tu bi rastî jî ji hezar salan zêdetir jiyabî, Kovrîn got. - Min nedizanî aşopên min dikarin heyberên wiha kêmpayda û nadir biafirînin. Lê çima wisan bi kêfxweşî li min dinerî? Ma ez te dihebînim?

- Belê. Tu yek ji wan ên kêm î ku hêjayî hindê ne ku jê re tê gotin ku bijartiyên Yezdan in. Tu xizmetkarê rastiya ebedî û herdemî yî. Ramanên te, armancên te, zanista te ya darîçav û xwiya û hemû jiyana te morek esmanî, morek yezdanî heye çimkî her tiştê di te de gorî û qurbanî awezmendî û bedewiyê ango tiştên herdemî û bêdemî hatiye kirin.

- Te got: tu xizmeta rastiya ebedî dikî... Lê ma mirov dikare xwe bigihîne rastiya ebedî û - madem jiyana herherî tine be - çî pêdivîtî bi rastiya herheyî heye?

- Jiyana herheyî heye, keşîş got.

- Ango tu ji nemiriya mirovan bawer dikî?

- Belê bêguman. Pêşerojek xweş û ewreng li benda we mirovan e. Û çî qas

zêdetir kesên mîna te li ser rûyê zevînê hebin, ew qas zûtir ew pêşeroj dê  
148

bê. Bêyî we, yên ku hûn di xizmeta pêşhêzên berztir de ne û bi azadî û zanebûnî dijîn, mirovatî dê hema bênirx bûya; bi pêşketina bi rêbaza xwe ya xwezayî ew ê hê demek pirr dirêj li benda bidawîhatina dîroka xwe ya dinyawî bûya. Lê kesên mîna te bi hezar salan zûtir serkêşî û pêşewatiya wê ber bi cîhana rastiya ebedî dikin - û ev yek biserketin û bidestxistina we ya berz û bilind e. Bereketa Yezdan, ku di kesên din de raketî û di xewê de ye, di we de geş bûye.

- De îcar mebest û armanca jiyana ebedî çi ye? Kovrîn pirsî.

- Mîna her tiştê din jî: zewq. Zewqa rastîn ji zanînê, û jiyana ebedî bêhejmar û bêdawî kaniyên zanînê dide. Tam ji ber hindê ye ku hatiye gotin: di mala Bavê min (mebest jê Yezdan e -çapa kurdî) de pirr jîngeh hene.

- Xwezî te bes bizaniya ka çi qas dilhebîn e ku guhdariya te dikim! Kovrîn got û ji xweşnûdiyê destên xwe gemirandin.

- Ez kêfxweş im.

- Lê dizanim: dema tu biçî, pirsê hebûna te bela xwe ji min venake. Tu spêle û xeyalet î, waswas î ku dikevî dilê min. Ango ez ji hêla giyanî de nexweş im, nenormal im?

- Hema bila wisan jî be. Çima nêaram bî? Tu nesax î ji ber ku te di ser şiyana û taqeta xwe re kar kiriye û tu westiyî û betiliyî lê ew tenê tê wê wateyê ku te tendiristiya xwe gorî armanc û hedefekê kiriye û nêzîk e ku dem bê ku tu dê jiyana xwe jî gorî û qurban bikî. Ê ma tiştê jê baştir heye? Jixwe ew pirrî caran armanca hemû kesên jêhatî û dilcewer e.

- Lê heke bizanim ku ez ji giyaniyê de nexweş im, ma dikarim ji xwe bawer bikim?



- Pa ma tu dizanî ka wan kesên bilîmet û dahî, yê ku hemû dinya jê bawer dike, jî spêle xeyalet nedîtine? Ma te nebihîstiya ku xwenda niha dibêjin ku bilîmetî û dînî xizmên hev in. Heval, tenê kesên jirêzê û celebî normal û sax in. Helwestên li hember serdema me ya hêrsbûyî, mandîbûna zêde, xerabebûna çande û kulturê û hwd. dikarin tenê wan kesan biqehirînin ên ku jê re mebesta jiyane jiyana vê serdemê ye angoy ji

wan kesan re ku mirovên rêzî û celebî dinimînin.

- Romiyên gotiya: mens sana in corpore sano. (bi latînî ye; wateya wê: giyanek sax dikare di bedenek sax de jî bijî - çapa kurdî)

- Her tiştê romiyên an yunaniyan gotiya ne îleh rast e. Hestiyariya boşbûyî, bengînî, jihalçûn - bi kurtî, hemû tiştên peyamber, helbestvan an canfîdayên ji bo rêbaz û baweriyên xwe tê dikoşin ji kesên din vediqetîne, ji bo hêl û hêzên mirov ên lawirî û heywanane, angoy ji bo tendiristiyê wî ya bedenî, xerîb in. Dubare dikim: heke tu dixwazî saxlem û sade bî, bikeve nav celeb û garana mirovan.

- Sosret e, tiştên ez pirrî caran ji xwe re dibêjim, tu niha dubare dikî, Kovrîn got. - Tam mîna ku te guhdarî û çavdêriya razdartirîn ramanên min kiribe. Lê em hew li ser min bipeyivin. Mebesta te bi jiyana ebedî çi ye?

Keşîş bersiv neda. Kovrîn çavên xwe li wî gerandin lê êdî rûyê wî nedît: Wesf û çawaniyên keşîş mezin bûbûn û dixwîya mîna ku ew helîbin nav mij û moranê. Paşî ser û dest bi tevayî wenda bûn; laşê keşîş di nav rûnişteke û tarîgewrika êvarê de wenda bû û ew filitî tinetiyê.

- Dilwasî nema! Kovrîn got û xwe kenand. - Mixabin!

Ew bi kêfxweşî û bextiyarî çû hindir. Wan çend gotinên keşîş ne tenê

xweheziya wî lê hemû giyanê wî, hemû hebûna wî dimeliqand û xweş dikir. Bibî bijartiyê Yezdan, di xizmeta rastiya ebedî de bî, di nav wan de 150

bî yên ku bi hezarsalan berî dema xwezayî mirovatiyê bikin hêjayî cîhanek yezdanî, bi gotinek din, mirovan ji berxwedanê, ji guneyan û ji azaran xelas bikî, her tiştê xwe - xortaniya xwe, hêza xwe, saxlemiya xwe - gorî rêbaz û baweriyê bikî, ji bo xweşbextiyek gelemper û hevpar canfida bî - ax çî parek berz e, çî karek bextewar e! Paşeroja Kovrîn, paşeroja pak, xama û têrxebat hat bîrê, hat bîrê ka çima ew qas xwendibû û çima wî bi xwe jî yên din perwerde kiribûn, û giha wê encamê ku di gotinên keşîş pirole û derewderxistina rastiye tîne bû. Tanya li nav baxçe hat pêrgî wî. Ew gihabû hin cilên din li xwe bike jî. - Hûn li vir in? wê got. - Em wisan li we gerîne, ew qas gerîne... Ma çî li we qewimiye? - Ew mat ma dema çavên xwe li rûyê Kovrîn ê geş û bikêf û

çavên wî, yên ku tijî rondik bûn, gerandin. - Hûn pirr xerîb dixwiyin, Andryuşa.

- Ez kêfxweş im, Tanya, wî got û destê xwe danî ser milê keçikê. - Ji kêfxweşiyê jî zêdetir, bextiyar im! Tanya, Tanyaya delal, hûn pêydakiriyek pirr dilhebîn in. Tanyaya delal, ez dilxweş im, pirr dilxweş!

Wî bi şewatî herdu destên keçikê ramûsandin û gudand:

- Aniha ez hin bîskên zelal, ên ecêb, ên din ser ên dinyawî re jiyame. Lê nikarim wan ji we re bibêjim çimkî hûn ê bibêjin ku ez dîn im an jî hûn ê ji min bawer nekin. De ka em ji we biaxivin. Tanyaya delal û dilvîn! Ez ji we hez dikim û hînê hezkirinê bûme. Nêzîkiya we û hevdîtina me ya dehancarî di rojê de têra xwe dilê min guherandiye. Nizanim ka heke ji vir çûm, ez ê çawa bêyî we bijîm.

- Erê herê! Tanyayê xwe kenand. - Piştî du rojan êdî hûn dê me ji bîr bikin. Em mirovên biçûk in, hûn kesek mezin û şandar in.

151

- Na, ka em jidil bipeyivin! Kovrîn got. - Ez ê we bi xwe re bibim, Tanya. Hûn çi dibêjin? Hûn çi dibêjin? Hûn dixwazin a min bin?

- Erê herê! Tanyayê got û dîsan da xwe ku bikene lê ken jê nehat û çilkên sor hilketin ser rûyê wê.

Nefeskişandina wê gurr bû û ew bi gavên lezgîn meşî lê ne ber bi xanî lê kûrtir bi nav daristanê ve.

- Ez li ser hindê nefikirîme... nefikirîme! wê got û destên xwe badidan mîna ku di bêhêvîtiyê de be.

Lê Kovrîn da pey wê, rûyê wî hê jî geş bû û dipeyivî:

- Ez bêriya wê evînekê dikim ku min bi her awayî dixê bin bandor û hikariya xwe, û evînekê wisan tenê hûn, Tanya, dikarin bidin min. Ez bextewar im! Bextewar!

Tanya tevîzîbû û gêj bûbû, ew ditewî mîna ku di bîskekê de bi deh salan pîr bûbe lê Kovrîn ew wek bedew didît û dilşadiya xwe bi dengbilindî radigihand:

- Ax ew çi qas xweşik e!

VI

Ku Yigor Semyonîç ji Kovrîn bihîst ku di navbera wî Tanyayê de ne tenê serpehatî û hezkirinek hebû lê ew dê herwiha dawet û dîlanekê jî li dar bixin, gelekî paş û pêş hat û çû û da xwe ku nearamiya xwe vebîşêre. Destên wî direcifîn, gerdana wî perçivî û xurî, wî ferman da ku hespê wî bi hentûra (erebeya) pêşbaziyê re bê zînkirin û çû derekê. Tanyayê, ya ku dît ka çawa bavê wê bi qamçiyên li piştê hespê dida û ka serê xwe çi qas

152

kûr, ta guhên xwe jî, daheşandibû şepqeyê xwe, rewşa wî ya kamax fam kir, xwe daxist odeya xwe û hemû rojê girî.

Di sera û giyaxaneyan ve xox û hilû gihabûn jî; dapêçandin û şandina wî fêkiyê xweşviyayî û nazik bo Moskovayê seqbêrî, xemxwerî û karek pirr û dijwar dixwest. Ji ber ku havîn gelekî germ û ziha bû, diviyabû ku her dar bê avdan; pirr dem û kedkar pêdivî bûn, xiştepişta kirmikan bû, kedkaran û ta Yigor Semyonîç û Tanyayê jî ew bi destan dimeriçandin; dilê Kovrîn jî pê radibû û nefretê ew digirt. Di ber her tiştên din re diviyabû

ku

sparîşên

fêkî

û

şitilên

payizê

bên

pêşwazîkirin

û

namegeriyek berfire û pirralî bê kirin. Û di vê dema herî pele û ecele de, ku dixwiya kesekî bîskek jî dema betal nîn e, diviyabû dest bi karê zeviyan bihata kirin ku vê yekê jî ji nivê zêdetir kedkarên baxçe dixwestin; Yigor Semyonîçê reşbûyî, jangirtî û hêrsbûyî ji derekî dilezî ya din û diqîrî ku aniha ew ê biteqe yan jî fîşekekê berbide eniya xwe.

Di ser hemûyê re jî dingeringa rihel û cihêzan ku ew jî li nik Pesotskiyan ne bênirx bûn; çikçika meqes û makîneyên cildirûnê, dûkêlfîrûna ji ûtiyan û lêzokî û kêfkariyên jina cildirû ya hêrsbûyî û bi asanî xeyîdok, serê her kesê di xanî ve dizivirand û gêj dikir. Û mîna ku ji bo acizkirinê

bin, her roj mêvan dihatin, diviyabû ew bên xwarandin, kêfandin û ta tika jê bê kirin ku bi şev jî li wir bimînin. Lê hemû ev karê zor bi bêhayjêbûnê, mîna ku di nav tarîmijê de be, dimeşî. Tanyayê wisan hest bi rewşa xwe kir mîna ku evînê û xweşbextiyê bi serdanserî xwe di wê werkiribe tevî ku ew hê ji çardehsaliya xwe ve ji ber sedemekê piştrast bûbû ku Kovrîn ji bilî wê kesek din ji xwe re nagire. Ew diheyirî, zimanlal bû, ji xwe bawer nedikir... Carinan di cî de lehiyek kêfxweşiyê diket dilê wê ku dixwest bifire ser ewran û li wir lavayî Yezdan bike, carinan dihat bîrê ku divê li meha gelawêjê ji mala xwe cuda bibe û bavê xwe bihêle û

-

Xwedê dizane ka çima - carinan diket dilê wê ku ew bêwec, ne-ti-tişt û bînirx e ji bo kesek ew qas bibandor ê mîna Kovrîn, - û hingê ew dilezî  
153

odeya xwe, derî li ser xwe diqilifand û bi saetan li ser hev digirî. Dema mêvan hebûn, serdanser ji wê re wer dixwiya ku Kovrîn pirr bedew û keşxe ye û ku dilê hemû jinan dikeve wî û jin li hember wê çavnebar û hesûd in, û hingê dilê wê bi kêfxweşî û serbilindiyê tijî dibû, mîna ku hemû dinya ya wê be; lê heke tenê Kovrîn bi kêfxweşî li keçxanimekê bibişiriya jî, Tanya bi behecockî direcifî, dilezî odeya xwe û - dîsan rondikan dibarandin. Van hestan ew bi temamî xistibû bin bandora xwe, wê bi şêweyek makîneyane alîkariya bavê xwe dikir, bala xwe ne dida xoxan, ne kirmikan, ne kedkaran û ne jî wê yekê ku dem çî qas bi lezgînî diborî.

Rewşa Yigor Semyonîç jî hema dişibî ya wê. Ew ji berbanga spêdeyê ta derengiya şevê dixebitî, bênavbirr ji ciyekê dilezî yek din, diqehirî û sebra xwe ji dest dida - û ev yek hemû di cure nîvxewek efsûnkirî de diqewimî. Niha di heman demê de du kesanî hebûn: yek Yigor Semyonîçê rastîn bû

ku dema li ravekirinên baxçevan Îvan Karlîç ên li ser guherbariya kar guhdarî dikir, pirça xwe bi bêhêvîtî dixwirand; yê din ê nerastîn, ê bi awayekî nîvsermest bû ku serdanser suhbeta binaverok radiwestand, destê xwe li milê baxçevan dida û dest bi pesnan dikir:

- Çi dibêjî, bêje, lê xwîna mîrasî pirr watedar e. Diya wê kesek ecêb bû, jinek hetabêbes dilcewer, ta bêjî hişmend bû. Kêfxweşiyek mezin bû ku li rûyê wê yê dilçak, zelal û pak, ê ku mîna yê firîşte û melekan bû, bê nerîn. Wê dizanî bi bedewî nîgaran bikişîne, helbest dinivîsîn, pênc zimanên biyanî dizanîn, stran digotin... Rebenê, bi jana zirav mir, Xwedê li giyanê wê were rehmê.

Vî Yigor Semyonîçê nerastîn axîn dikişandin û piştî ku bîskeke bêdeng dima, didomand:

- Dema kurik biçûk bû û li ber dest û xweyîkirina min bû, rûyê wî mîna yê diya wî firîşteyane, ron û tijî pakî bû. Awirên wî, liv û lebatên wî û

154

şêweyê axivîna wî hindî yên diya wî şîrîn û kubar bûn. Pa jîrî û hişmendiya wî? Wî hertim em bi jîriya xwe diheyirandin. Ma çî bibêjim, ma ew ê wek din çawa bibûya zanistvan! Çawa! Û bisekine, tu dê bibînî ka piştî deh salên din ew ê çî be! Ew ê wisan bilind bibe ku tu dê negihî destê wî jî!

Lê di heman demê de Yigor Semyonîçê rastîn serdanser li xwe divarqilî û rûyê xwe mîna yên stemkaran dimirûçand, dest diavêt serê xwe û dest bi qîrînê dikir:

- Wan şeytanan! Baxçe herimand, pûç kir, wêran kir! Baxçe nema!  
Fermana hilweşîna hemû baxçe ye!

Li aliyê din, Kovrîn karê xwe mîna berê bi zîrekî didomand û hema haya wî jî ji geremol û qerebalixa li dorê tine bû. Evîn mîna petrola biavêjî ser

agir bû. Her car, piştî ku wî Tanya didît, bizewq û dilşadî vedigerî odeya xwe û bi heman coşê, ya ku wî Tanya ramûsandibû û jê re li ser evîna xwe peyivîbû, wî dest diavêt pirtûkekê yan jî li destnivîsa xwe kûr dibû. Wê yekê, ya ku keşîşê reş li ser bijartiyên Yezdan, rastiya ebedî, pêşeroja ewreng û muhteşem a mirovatîyê û her wiha gotibû, wateyek taybet, wateyek nerêzî dida xebata wî û dilê wî bi serbilindî, zanaviya ji erka xwe ya berz dadigirt. Wî her hefte carekê yan du caran keşîşê reş di nav baxçe de yan jî li hindir didît û pê re dişêwirî lê êdî van hevdîtinan ew neditirsand, berevajî, ew kêfxweş dikir çimkî ew bi kûrî piştrast û bibîrdoz bûbû ku xeyaletên wiha tenê dihatin seredana kesên bijartî, yên bibandor, yên ku xwe û jiyana xwe gorî xizmet û xebatên pîroz kirine. Carekê dema firavîne keşîş lê xwiya bû û rûnişt ber pencereya xwaringehê. Kovrîn dilxweş bû û bi hosteyane suhbetek bi Yigor Semyonîç û Tanyayê re dest pê kir ku dizanî mijara gotûbêjê bala keşîş jî dikişîne. Yigor Semyonîç û Tanyayê jî guhdarî kir û bi kêfxweşî bişirîn bêyî tê derbixin ku Kovrîn ne ji wan lê ji dilwasiya xwe re dipeyive.

155

Di navbera wan rojan de dema rojiyan a ji ber hilketina Meryem Xamayê (mebest jê diya Hz. Îsa ye - çapa kurdî) ya ber bi esmanan de hat û piştî hingê êdî dema dawet û dîlanê bû ku li ser daxwaza serhişk a Yigor Semyonîç bi "heytehol û teqereq" ango bi şahiyek bêwêne du rojan li ser hev hat kirin. Bi bihayê sê hezar rubleyan hat xwarin û vexwarin lê ji ber muzîka nexweş a kirêkirî, şingeringa şûşeyan, dingedinga beza piyên xizmetkaran, geremol û qerebalixê kesekî ne dizanî nirxekî bide vexwirekên bihagiran û ne jî xwirekên biçêj û bitam ku ji Moskovayê hatibûn anîn.

VII

Şevêk ji şevên dirêj ên zivistanê Kovrîn xwe di nav nivînên xwe de diqelizand û romanek fransî dixwend. Tanyaya reben, a ku ne-elimîbû jiyana bajar û geremoliya wê ku ji ber hindê êvaran serê wê diêşî, hê ji mêj de di xew çûbû û niha carinan di xew de hin hevokên parçeyî bi lêv dikirin.

Saet bû sê. Kovrîn şemal temirand û xwe pal da; bîskek dirêj wî çav neqandî xwe di nav nivînan de gevizand lê xewê nedikarîbû bi çavên wî bikeve ji ber hindê - bi gotina wî - ku di odeyê ve germ bû û Tanyayê xewn didîtin. Li dorên çar û nivê wî dîsan şemal hilkir û di heman demê de dît ku keşîşê reş li ser palkursiya li nêzî doşeka wî rûniştî ye.

- Silav, keşîş got û piştî ku delîvekê bêdeng bû pirsî: - Tu niha çi diramî?

- Şan û şoretê, Kovrîn bersivand. - Di wê romanê, ya ku min gava din dixwend, de zelamek, xortek xwenda tê teswîrdan; ew bêaqiliyan dike û di nav derd û azarên xwe de zerzepalî dibe û reng lê namîne; bi baweriya min ev kul û derdên wî bêhişî ne.

156

- Ji ber ku tu hişmend î. Tu guh nadiyê mîna pêlîstokekê ya ku bala te nakişîne.

- Belê, rast dibêjî.

- Navdarî û meşhûrî te naxapînin. Çi xweşî yan hode û sûd an ders û wane tê de heye ku navê te li ser peykelê gorrê bê kolandin madem her dem nivîsê bi zêrkirina wê ve jê bibe? Xweşbextî ye hûn ew qas gelek in ku bîrdanka mirov a qels nikare navên hemûyan di xwe de tomar bike.

- Baş tê digihim, Kovrîn îtîraf kir. - Ê ma çi sedem heye ku bîrdankê tomarkirin? Lê em ji tiştê din bipeyivin. We mînak ji bextiyariyê. Bext çi ye?

Dema saetê xwe li pêncê da, Kovrîn li ser lêva doşekê, ling li ser merşikê,



rûniştî bû û ji keşîş re dipeyvî:

- Berê zelamek bextewar ji xweşbextiya xwe bizdî û behecî - bextiyariya wî ew qas pirr bû - û ji bo ku xwedayan dilnêrm bike, gultîlka xwe gorî wan kir. Te bihîstiye? Mîna Polykrates, bextiyariya min jî hêdî hêdî min xemgîn dike. Ji min re xerîb û seyr e ku ji spêdeyê ta derengî şevê tenê hest bi kêfxweşiyê dikim, ew min dadigire û hemû hestên min ên din difetisîne. Êdî nizanim ka xemgînî, kovanî an acizbûn çi ye. Wek dibînî, niha jî nanivim, xewa min nayê lê dîsan jî aciz nabim. Ji dil bibêjim: EZ MATMAYÎ ME.

- De çima? keşîş heyirî. - Ma dilşadî hestek derexwezayî ye? Ma gelo ew nikare rewşa normal û asayî ya mirovan be? Mirov çi qas li astek bilindtir a jîrî û exlaqî be, ew qas zêdetir jiyan jê re zewqek mezintir tîne. Sokrates, Diogenes û Marcus Aurelius jî hest ne bi xemgîniyê lê bi dilşadiyê dikirin. Hewariyek jî dibêje: Bênavberr kêfxweşiyê bikin. Tu jî kêfxweşiyê bike û bextiyar be.

157

- Pa heke xweda biqehirin? Kovrîn bi henek got û kenî. - Heke ew hemû xweşiyên jiyanê ji min bişelînin û bihêlin ku ez sarma û birçê bibînim, qet bawer nakim ku hingê bi dilê min be.

Tanya di wê navberê re şiyar bûbû û hem heyirî û hem jî ji tirsê bizdayî li mêrê xwe temaşe dikir. Mêrê wê li palkursiya virtîvala zivirîbû, dikenî û destên xwe li ba dikirin; çavên wî dibiriqîn û di kenê wî de tişteke xerîb hebû.

- Andryuşa, tu bi kê re diaxivî? Tanya pirsî û xwe avêt destê mêrê xwe yê ku heman dest rabeirî keşîş kir. - bi kê re, Andryuşa?

- Ez? Bi kê re? Kovrîn heyirî. - A bi vî re... Va ye rûniştî ye... - Wî tiliya xwe bi aliyê keşîşê reş ve kir.

- Kes li vir nîn e... kes nîn e! Andryuşa, tu nexweş î.

Tanyayê mêrê xwe hemêzand, xwe li hember wî givaşt û bi destê xwe çavên wî miçandin mîna ku bixwaze wî ji xeyaletan biparêze.

- Tu nexweş î! wê qorr berda girî û ji serî ta binî dilerizî. - Li min bibore, delalê min, lê ji mêj de ye min hay jê bûye ku tu ne tamam î... Tu ji hêla giyanî de nexweş î, Andryuşa.

Recif û lertzika Tanyayê dest pê kir Kovrîn jî girt. Wî carek din jî li palkursiyê nerî ku êdî vala bû, bi lawaziyek zûhatî hem piyan û hem jî destan hesî, tirsî û dest pê kir cil li xwe kirin.

- Tişt nabe, Tanya, tişt nabe, ew lertzokane minminî. - Bi rastî jî ez hinekî ne li ser xwe me... dem e ku aşartîş û îtîraf bikim...

- Min hê ji mêj de hay jê bûye... û bavo jî hay jê bûye, Tanyayê got û di ber re tê dikoşî ku xwe bihedinîne. - Tu bi xwe re suhbetê dikî, bi awayek seyr dibişirî... ranakevî. Oy Xwedêyo, Xwedêyo, me biparêze! wê di xoffî û

158

erjengiya xwe de got. - Lê netirse, Andryuşa, netirse, ji bo Xwedê, netirse...

Tanyayê jî dest pê kir cilên xwe li xwe kirin. Yekem car niha, dema li jina xwe dinerî, Kovrîn di hemû xeteriya rewşa xwe giha, fam kir ka keşîşê reş û suhbetên bi wî re dihatin çî wateyê. Niha jê re zelal bû ku dîn û şêt bûye.

Herduyan, bêyî ku bizanin çima, cilên xwe li xwe kirin û çûn saloneyê: jin li pêşiyê, mêr jî li pey wê. Yigor Semyonîçê hawran û palerîn li ser milan û şemal di destî de li wir bû, li giryê Tanyayê şiyar bûbû; hingê ew mêvanê zavayê xwe bû.

- Netirse, Andryuşa, netirse... Tanyayê digot û di ber re, mîna ku tayê

girtibe, direcifî. - Bavo, ev ê derbas bibe... her tişt dê baş bibe...  
Kovrîn wisan nearam bû ku nedikarî bipeyive. Wî xwest bi dengê henekî  
ji xezûrê xwe re bibêje:

- Min pîroz bikin, wer dixwiye ku min hiş û aqilê xwe ji dest daye, - lê  
tenê lêvên wî livîn û bi dilêşî bişirî.

Li dorên saet nehê sersaqoyek û kurkek lê hatin kirin, xawliyek lê hat  
rapêçandin û bi hentûran hat birin nexweşxaneyê. Êdî Kovrîn dest pê kir  
ku li xwe hişyar be û matî ji xwe bike.

### VIII

Dîsan bû havîn û nojdar (bijîşk) ferman da ku Kovrîn jiyana xwe ya  
havînê li derveyî bajar biborîne. Ew sax bûbû, êdî keşîşê reş nedidît û  
niha dora başkirina kewna bedenê bû. Dema ew li gund li mala xezûrê  
159

xwe dima, pirr şîr vedixwar, rojê tenê du saetan dixebitî, ne mey  
vedixwar û ne jî cigare dikişandin.

Êvara erefeya Roja Elyas li mala xezûr cejnek dua- û lavakirinê hat  
lidarxistin. Dema berdest amana bixurê da dest qeşe, bîna goristanê ji  
salona fire ya kevn hilfûrî û bîna Kovrîn teng bû. Ew derket nav baxçe.  
Bê ku haya wî li ser gulên bedew û xweşik be, ew li dû serê xwe gerî,  
rûnişt ser rûnişteke, paşî li nav parkê gerî; ku hat rizdeka çem, daket jêr  
û demek dirêj li avê nerî û ponijî. Darçamên rûtarî, yên ku par Kovrîn  
wek kesek ciwan, kêfxweş û çeleng dîtibû, niha nedihumîn jî lê bêliv û  
bêziman rawestî bûn mîna ku qet Kovrîn nenasin. Ê bi rastî jî dijwar bû  
ku Kovrîn bê nasîn: Serê wî bi dersokê hatibû pêçandin, porê dirêj î  
bedew êdî lê nebû, livîna wî sist bû, rûyê wî gilovirîbû û spîçolkî bûbû.  
Bi darpirê ve wî xwe gihand aliyê din ê beravê. Li wî cî, yê ku par lê şilêl  
hebû, niha xirpûk û xamkêsanê serik jê hatî dirûn dima. Roj ava bûbû,

û li qeraxa esman, li şûna rojê, sorîgewrika êvarê diçirisî û pêşbîniya hewayek batund ji bo sibê fikir. Bêdengî bû. Kovrîn bi qasî bîst deqeyan ango ta sorîgewrik vemir, fikir wî cî, yê ku par yekem car keşîşê reş lê jê re xwiya bûbû...

Dema ew bi sistî û ji hêla hindirîn de ne xweşnûd vegeirî malê, perestîş û îbadet bi dawî hatibû. Yigor Semyonîç û Tanya li kepirê û terasê rûniştî bûn û çay vedixwar. Wan li ser tişteki suhbet fikir lê ku wan Kovrîn dît, dev ji wê suhbetê berda, û Kovrîn di rûyên wan derxist ku suhbet li ser wî bû.

- Bawer dikim dema te ye ku şîrê xwe vebixwî, Tanyayê ji mêrê xwe re got.

- Na, ne dem e, mêrê wê got û li derazînka jêrîn a pêlingê rûnişt. - Tu bi xwe vebixwe. Ez naxwazim.

160

Tanyayê bi xembarî berê xwe da bavê xwe û bi dengê lêborînxwazî ji mêrê xwe re got:

- Te bi xwe jî hay jê heye ku şîr ji bo te bikelk û baş e.

- Belê, pirr bisûd e! Kovrîn xwe kenand. - Ez we pîroz dikim: ji roja îne şûnde wezna min dîsan bi ritleyekê zêde bûye. - Wî bi herdu destan serê xwe givaşt û bi jan gudand: - Çima, çima we matî ji min kiriye û sereguhiya min kiriye? Dermanê bromî, betalî, hemamokên germ, çavdêrî,

sereguhî, tirsek ji ber her pariyê ez diavêjim devê xwe, her gavek diavêjim

- ev hemû dê dawiya dawîn min bibe nav îdîotîzm û şetgeriyê. Min hiş û aqilê xwe wenda kir, bi êşa dilwasiya gewretiyê (megalomanî) ketim lê dîsan jî ez kêfxweş, çeleng û ta bextiyar jî bûm, balkêş û taybet jî bûm.

Niha ez hişmendtir û qelewtir bûme lê ez bûme mîna her kesek din: ez

navincî û rêzî me, ev jîyan li min nayê... Ax, we çî qas stemkarî li min kiriye! Min dilwasî hebûn lê wan kî nerehet dikir? Dipirsim: wan kî nerehet dikir?

- Xwedê bizane tu çî dibêjî! Yigor Semyonîç axîn kişand. - şerm dikim li te guhdarî jî bikim.

- De guhdarî nekin, ma min ji we xwestiye!

Haziriya mirovan, bi taybetî jî ya Yigor Semyonîç hingê Kovrîn hêrs dikir; wî bi hişkî, sersarî û ta bi xwemezinî bersiva xezûrê xwe dida û ji bilî bi awayek henekpêkirin an dijminatî qet lê nedinerî; Yigor Semyonîç diheyirî û wek gunekar dikuxkuxî tevî ku hest pê nedikir jî ku tawanbarê tiştêkî ye. Tanya, bê ku tê bigihe ka sedem çî bû ku têkiliyên dilvînî yên bavo û Andryuşa wisan bi tundî û tûjî xetimîbûn, nêzî bavê xwe bû û bi xemgînî li çavên wî nerî; wê dixwest her tiştî tê bigihe lê dîsan jî nedikarî, lê ji wê re tenê ew yek zelal û averû bû ku têkiliyên herduyan roj bi roj xerabtir dibûn, ku bavo di van demên dawîn de pirr pîr bûbû û ku

161

Andryuşa her hêrsbartir, hişkaxivtir, belakirrtir û bêsebrtir dibû.

Tanyayê êdî ne dikarî bikene û ne jî bistre, li ser firavînê tiştêk nedixwar, çendîn şevan ranediket ji ber ku li benda belayek erjeng bû, û ji ber vê rewşê ew qas jan dikişand ku rojekê ji dema firavînê ta êvarê bêhiş ket. Li dema perestîşaa berî bîskekê wê hay jê hebû ku bavê wê digirî, û niha, dema ew her sê li terasê rûniştî bûn, ew tê dikoşî ku wê yekê neîne bîra xwe.

- Ax çî qas bextiyar bûn Buda û Mihemed an Shakespeare ji ber ku xizmên wan ên xweşdivî bi sereguhîkirina wan jihalçûn û îlhama wan jê nedistandin! Kovrîn got. - Heke Mihemed dermanê brom bixwara daku demarên xwe bihedinîne, rojê tenê du-sê saetan xebitîbûya û şîr

vexwaribûya, nifşên dû wî dê ew kesaniyê ew qas bibandor û balkêş ji seyê wî zêdetir nenasiya. Nojdar û bijîşk, xizm û lêzim wek encam wê yekê dikin ku dawîya dawîn mirovatî êdî bimiçiqe, êdî navincîtî û rêzîtî dê wek bilîmetiyê bên hesibandin û çande û kultur dê biruxe. Xwezî we bizaniya, Kovrîn bi mixabî got, - ka ez çî qas spasdarê we me!

Wî hest bi silikîn û xeyidînek bihêz kir û, ji bo ku zêde nepeyive, rabû ser xwe û çû hindir. Bêdengî bû, di pencereyên vekirî re bîna tûtînê û calapayan xwe dida hindir. Lekeyên tavheyvê diketin ser tekber û rûyê salona berfire yî tarî û piyanoya bidûvik. Havîna par a bextiyar, dema hingê jî bîna calapayê hildifûrî û heyvê şewqa xwe di pencereyan re dida hindir, hat bîra Kovrîn. Ji bo ku xwe bigihîne asta rewşa havîna borî, ew zû çû odeya xwe, cixarek stûr vexist û bangî xizmetkar kir ku meyê jê re bîne. Lê cixarê tamek tal û dilraker da devê wî û tama meyê jî ne dişibî çêja meya par. Dema mirov jê biyanî bibe, wiha dibe! Ji cixarê û du qurçên meyê serê Kovrîn zivirî û dilê wî jî wisan qutî ku ew neçar ma xwe bispêre dermanê brom.

Ji berî çûna razanê Tanyayê jê re got:

162

- Bavo te pirr diecibîne. Lê tu ji ber sedemek nediyar dijminatîya wî dikî û ev yek bi kûrî wî xemgîn dike. Ka lê binere: hema ew di çavan re pîr dibe. Ji te lava dikim, Andryuşa, ji bo navê Xwedê ji te lava dikim, ji bo hedana min a giyanî, ji wî re dostane be.

- Ne dikarim û ne jî dixwazim!

- Lê çima? Tanya pirsî û dest pê kir ku ji serî ta binî recifî. - Bêje, çima na?

- Ji ber ku ew dilçepel e, ji ber hindê ye, Kovrîn bi xemsarî bersivand û

milên xwe hejandin. - Lê em êdî hew ji wî bipeyivin: nexwe ew bavê te ye.

- Nikarim, nikarim tê bigihim! Tanyayê got û destên xwe li cênîkên xwe şidandin û rasterast li niqteyekê nerî. - Tişteke bêwêne, tişteke erjeng dê bê serê me. Tu guheriyî, tu êdî ne xwe bi xwe yî... Tu, mirovek awezmend, nerêzî, ji ber tiştên biçûk diqehirî, serê xwe dikî nav tiştikên bêwec de... Tiştên wisan bêwate te disilikînin û dixeyidînin ku carinan mirov pirr dihêbitînin û mirov nikare ji çavên xwe bawer bike: ma ew tu yî yan kesek din e? Na, na, nexeyide, sil nebe, wê, ku ji gotinên xwe tirsî, domand û destên mêrê xwe ramûsandin. - Tu hişmend î, baş î, dilcewer î.

Tu dê bi dadperwerî li hember bavo tev bigerî. Ew jî pirr baş e.

- Ew ne baş e lê pîstbaş e. Ew mamok û xalokên stranbêj, ew rûyên qencîxwaz, ew rêzdar û birêzên bi awarteyî zêde mêvanperwer, wan hemûyan hem di çîrokan de, hem di şanoyan de û hem jî di jiyana rastîn de carinan bala min kişandiye lê niha ew li ber min dilçepel e. Ew ta gewriya xwe tijî ezperestî û egoîzmê ne. Tişta herî kerixîner di wan de qelewiya wan û xweşbînî û optîmîzma wan e ku hemû serekaniya xwe ji zikê wan digire û ji gamêş û berazan re taybetmendî ye.

Tanya rûnişt ser doşekê û serê xwe danî ser balguh.

163

- Ev îşkence ye, wê got, û hema ji dengê wê jî diyar dibû ku ew bêsînor westîbû û betilîbû û ku jê re dijwar bû bipeyive. - Ji zivistanê şûnde bîskek bi tenê jî ya aramiyê tine bûye... Ev malwêranî ye, ax, ax Xwedêyo! Ez pirr bi vê yekê diêşim...

- Belê, bêguman ez Herodes im lê tu û bavokê xwe, hûn biçûkokên Misrê ne. Bêguman!

Rûyê wî ji Tanyayê re kirêt û kerixîner dixwiya. Dijminatî û mad û mirûzê tinaz û galte li wî nedihat. Hê berî hingê Tanyayê hay jê bûbû ku niha tiştê ji rûyê wî kêmbû, tam mîna ku bi kurrkirina porê wî re taybetiyên rûyê wî guherîbin. Tanyayê dixwest tiştê dilêşin jê re bibêje lê wê xwesteka xerab ew hilceniqand, ew tirsî û ji odayê derket.

IX

Kovrîn pişk û kursiya xwe ya serbixwe bi dest xist. Hatibû biryardan ku waneya merasîma vekirina roja duyem a meha berfanbarê bê lidarxistin û daxwiyaniyek jî li ser wê li bersifk û korîdora zanîngehê hatibû daliqandin. Lê wî wê rojê bi birûske û telgrafê ji berpîrsê fermî yê xwendekaran re ragihand ku nikare ji ber nesaxiya xwe waneyê bide. Xwîn ji gewriya wî dihat. Bi kuxînê re her carê piçîkek dihat lê di du-sê mehan de bû ew qas ku rewşa wî bêyom xerab bû û ew ket rewşek xewbarî. Vê êşê ew hema qet neditirsand ji ber ku dizanî ku diya wî ya biheştî jî bi qasî deh salan, belkî zêdetir jî, ketibû ber vê êşê lê dîsan jî jiyabû; nojdaran jî ew dibawerand ku ew êş ne zêde taloke bû, û ew şîret dikir ku hêrs nebe, jiyaneke asayî bijî û kêmbipeyive.

164

Meha rêbendanê waneya vekirinê ji ber heman sedemê hat paşvexistin û

li reşemehê êdî dereng bû ku dest bi kursê bê kirin. Diviyabû ji bo sala bê were paşvexistin.

Kovrîn êdî ne bi Tanyayê lê bi jinek din re dijiya. Jin du salan ji wî mezintir bû û mîna ku Kovrîn zarok be sereguhiya wî dikir. Kovrîn sernerm bûbû; wî bi dilxwazî xwe radestî her tiştî dikir û dema Varvara Nîkolayevna - hevjiîna wî - rêwîtiya Krîmê pêşniyaz kir, wî ew jî pejirand



tevî ku pêşbînî dikir ku tişteke baş dê pê ve neyê.

Ew êvarê gihan Sevapolê û li otêlekê rawestîn daku bîna xwe vebikin û roja din rêwîtiya xwe bidomînin Yaltayê. Herdu jî ji ber west û mandîtiyên rêwîtiyê kerixîbûn. Varvara Nîkolayevna çay vexwar, ket nav nivînên xwe û piştî kurtebîskekê di xew çû. Lê Kovrîn xwe pal neda. Hê bi saetan berî ku ji malê bi rê bikeve, nameyek jê re ji Tanyayê hatibû lê ta niha jî bisteyî nekiribû û newêrbû wê vebike; name niha di paşila wî de bû û bi awayek neşîrîn ew nêram dikir. Bi dilpakî, di kûriya dilê xwe de, wî zewaca bi Tanyayê re wek şaşîti dihesiband, bi xwe razî û xweşnûd bû ku niha jê dûr ketibû, û bibîranîna wê jinê, ya ku hêdî hêdî bûbû bermayiyek pîroz, a bi dest û bi pî û xwedî çavên biawir, çavên hişmend, - tenê berketin û poşmanî dixist dilê Kovrîn. Destxeta li ser zerfê nameyê anî bîrê ka wî berî du salan çawa bi bêdadî û stemkarî tola valatiya xwe ya giyanî, nerehetiya xwe, tenêti û bêkesiya xwe û dilnexweşiya xwe li kesên tam bêgune û bêtawan hilanîbû. Di ber re hat bîrê ka wî çawa teza xwe û hemû nivîsarên xwe, yên ku di dema nesaxiya xwe de nivîsîbûn, çirçirandibûn, û çawa pirtikên hûrkirî û avêtî li ber ba pirpirîbûn û bi dar û gulan ve zeliqîbûn.; di her rêz û xetek wan nivîsan de wî armanc û daxwazên sosret û bêbingeh, gef û tehdîdên aqilsivik, bêşermî, dilwasiya meziniyê dîtibûn, û hemû yekê wisan lê kiribû mîna ku ew naveroka guneyên xwe bixwîne; lê ku dawîya dawîn lênivîsk û defter hatibû dirandin û di pencereyê re firîbû derve, wî serdanser hest bi mixabinî û

165

dilmanê kiribû, çûbû cem jina xwe û pirr tiştên xerab gotibûnê. Ax Xwedêyo, wî bi çî awayî Tanya îşkence kiribû! Carekê, ku xwestibû janê bide Tanyayê, wî jê re gotibû ku xezûrê wî rolek neyînî di pêwendiyên herduyan de lîstibû çimkî ji wî xwestibû ku bi Tanyayê re bizewice; ev

gotin bi bêdestî kesekî çûbû guhê Yigor Semyonîç, ew bezîbû hindir, ji ber şaşbûn û bêhişbûna ji sedema van gotinan nikarîbû zimanê xwe jî bigerîne, bi piyên xwe pêqutkane kiribû û nedikarî dengê ji xwe derbîne mîna ku şelalê zimanê wî girtibe û tele bûbe. Dema Tanyayê li bavê xwe temaşe kiribû, bi dengê dilperitîn qîjîbû. Ev bûyer nikare bê vegotin. Bi tenê vê destxeta nas ev hemû bîranîn vedijandin. Kovrîn çû şaneşînê; ba nerm û germ bû, bîna deryayê dihat. Ji rûyê kendavoka bi sosret bedew heyv û herwiha şewle û gulopên hawirdor diteyisîn; reng wisan bû

ku dijwar e bê teswîrdan. Ew tevheviyek nermîn a keskî û şîniyê bû; geh wisan dixwiya ku avê xwe dixîfand boriyek şîn, geh jî wer dixwiya ku heyv darijiye û li şûna avê wê çivanek û kendavok dagirtiye; - wek giştî ger lê bê nerîn - çi ahengiyek rengan, çi rewşek aram, tena û berz bû! Dixwiya ku li qata jêrîn, di bin şaneşînê ve, pencere vekirî bûn çimkî deng û kenê jinan zelal û xweş dihat. Îhtîmal e li wir ji bo şevborkekê li hev civîbûn.

Kovrîn dawiya dawîn bisteyî da xwe, name vekir û, ku vegeerî hindir, dest bi xwendina wê kir:

"A berî bîskekê bavo mir. Ji bo wê yekê ez spasdara te me, te ew kuşt. Baxçeyê me wêran bûye, niha xerîb û nenasan xwe lê kiriye xwedan, ango tam mîna bavê min ê reben ditirsî qewimî. Ji bo wê yekê jî spasdara te me. Ji hemû dilê xwe te dinifirînim û hêvî dikim ku tu bikevî ber xezebê û ew zû te biruxîne. Ax çi qas derd û kulan dikişînim! Janek bêhesret dilê min dişewitîne... Lanet li te bibare! Min tu wek kesek nerêzî, kesek jîr dihesibandî, min ji te hez dikir lê diyar bû ku tu dîn î..."

166

Kovrîn nedikarî xwendinê bidomîne, name çirand û pirtikên wê avêtin. Nearamiyekê, ya ku dişibî tirsê, ew girt. Varvara Nîkolayevna li pişt perdeyê raketibû, tenê dengê nefesa wê dihat; ji qata jêrîn deng û kenê jinan ta wir dihat lê Kovrîn wer hest dikir ku ji bilî wî benderuhek di hemû otêlê ve tine bû. Ji ber ku Tanyaya xemê dil lê helandî di nameya xwe de xezeb lê barandibû û hêvî kiribû ku ew biruxe, wî rewşa xwe tengav û dilgîvêş hîs dikir û her bîskekê çavên xwe zîqî derî dikirin mîna ku bitirse ku ew hêza nenas, a ku berî du-sê salan ji wî û xizm û lêzimên wî re bûbû sedema belayên mezin, dîsan bê.

Wî ji serboriyan dizanî ku dema mejî nerehet be, baştirîn derman kar e. Diviyabû li ber maseyê rûbine, çawa dibe bila bibe, seqbêrî û hişê xwe bide ser tenê tiştêkî. Wî ji gîrfanê xwe yê sor lênivîskek deranî ku karek berhevki yê biçûk li ser nexişandibû û tam ji bo wê yekê heke bi rê ve bêsebr bibe bi xwe re anîbû. Wî xwe da ber maseyê û dakûrî gelale û miswedeyê; zû wer diyar bû ku rewşa wî ya aram, sernerm û rêkûpêk vedigerî. Lênivîskê bala wî kişand ser pele û eceleya dinyayê jî. Ew fikirî ku divê mirov ji bo her xweşiyek ku jiyana didiyê, yê herî asayî û bêwate jî, çî qas bihayek giran bide. Loma, wek mînak, ji bo ku bikare di çilsaliya xwe de pişk û kursiya xwe bi dest bixe, ji bo ku bibe profesorek sade daku paşî bi zimanek sistopisto, nexweş û giran û di ser her tiştî re jî raman û helwestên biyanî û xerîb bileqleqe, - bi kurtî ji bo ku bigihe pileya xwendayek navincî, pêdivî bû ku ew pazdeh salan bixwîne, bi şev û roj bixebite, li hember nesaxiya giran a giyanî li ber xwe bide, êş û jana zewacek biserneketî bikişîne, pirr celeb bêhişiyana bike û ziyanan bigihîne xelkê ku baştir e niha wan tiştan neîne bîra xwe.

Kêm mabû ku lênivîskê dê dilê wî rehet bikira lê nameya çirandî li erdê bela xwe ji dalepîn û konsentrebûnê venedikir. Ew ji ber maseyê rabû, pirtikên kaxezê civandin û avêtin derve lê bayek sivik ji deryayê ve lê da

û ew li ser milbendê pencereyê belav kirin. Dîsan nearamiyê, ya ku dişibî  
167

tirsê, ew girt û dîsan wer dixwiya ku ji bilî wî di hemû otêlê ve  
benderuhek tine bû... Ew çû şaneşînê. Kendavokê bi çendîn çavên şîn î  
vekirî, şîn î tarî, rengê pîrozeyî û jîndarî agirîn li wî dinerîn û bala wî  
dikişandin xwe. Bi rastî jî hewa germ û fetisînok bû, avjenî- û  
melevanîkirin dê pirr bi kêrî bihata.

Li qata jêrîn li bin şaneşînê serdanser dengê kemanê hat û du dengên  
nermîn ên jinan dest bi strînê kirin. Tiştek nas di stranê de hebû. Di wê  
romansê, ya ku dihat strîn, de basa keçek dîn û şêt a bi şevê hin dengên  
razdar û sirr ji nav baxçe dibihîstin, dengên ew qas bedew û seyr bûn ku  
wê ew wek ahengek pîroz hesabandin ku ji aliyê me yên mirbar de nayê  
têgihîn... Nefesa Kovrîn xîrikî, di dil de hestek têrxem hebû lê di heman  
demê de kêfxweşiyek sosret, kêfxweşiyek şirîn, a ku ji mêj de ji bîr bûbû,  
di sînga wî de dest bi jenînê kir.

Peykelek reş î bilind, ê ku dişibî bahoz an bazivrokê, li aliyê din ê berava  
kendavokê xwiya bû. Ew bi lezgîniyek erjeng di ser kendavokê re ber bi  
otêlê ve dilivî û her bîsk biçûktir dibû; hema Kovrîn negiha xwe ji rêya wî  
vebide jî. Keşîşê pêxwas, serkol, serspîbûyî, birûreş, dest li ber sîngî, di  
ber wî re virrî û li nîveka odeyê rawestî.

- Çima ji min bawer nakî? wî bi lomêkî ji Kovrîn pirsî lê bi nermî lê nerî. -  
Heke te bawer bikira ku tu bilîmet î, pêdivî nebû ku te ev herdu sal wiha  
bi xemgînî û tijîkulî biborandana.

Kovrîn niha dîsan bawer kir ku bijartiyê Yezdan e, bi jîndarî hemû  
suhbetên wî yên bi keşîşê reş re hatin bîrê û wî dixwest bipeyive lê êdî  
xwîn ji devî rasterê diherikî sîngî û, ku nizanî çi bike, bi destên xwe sînga  
xwe gerandin, û xwînê devzendik şil kirin. Wî da xwe ku bangî Varvara

Nîkolayevnayê, ya ku li paş perdeyê nivistî bû, bike, tê koşî û ji devê xwe derxist:

168

- Tanya!

Ew ket erdê û gava rabû ser destên xwe, dîsan bang kir:

- Tanya!

Wî bangî Tanyayê dikir, gazî baxçeyê mezin û gulên wî yên xunavê şilkirî dikir, bangî park, darçamên wê yên rîşgij, bangî zeviya şilêl, zanista xwe ya sosret, xortaniya xwe, bisteyî û wêrekiya xwe, kêfxweşiya xwe, bangî jiyana xwe, ya ku ew qas bedew bû, dikir. Li erdê li rex rûyê wî çavên wî bi lîçek mezin a xwînê ketin û wî di lawaziya xwe ya zûhatî de nedikarî peyvekê jî bi lêv bike lê hestek bextiyariyê ya bêwêne, bêsinor hemû bûneweriya wî dagirtibû. Ji bin şaneşînê ve dengê serenadê dihat lê keşîşê reş ji wî re dipistî ku ew bilîmet e û dê tenê ji ber hindê bimire ku bedena wî ya lawaz teraz û hevsenga xwe ji dest daye û êdî ew nikare xwe

li ber barê bilîmetiyê bigire.

Dema Varvara Nîkolayevna şiyar bû û ji paş perdeyê hat, Kovrîn miribû jî û bişîrek bextewar î pak li ser rûyê wî mabû.

1894

169

Kefîsor

Jacob û Wilhelm Grimm

Hebû nebû, keçîkek biçûk ya wa şîrîn hebû ku her kesî jê hez dikir lê herî zêde ew li ber dilê dapîra xwe delal bû. Dapîra wê herdem diyariyên xweş didanê. Carekê kefiyek sor ya qedîfeyî dayê. Kefî wa spehî bû ku

keçikê êdî nedixwest ti tiştêk din bike serê xwe ji bilî wê. Lew her kesî êdî navê wê kiribû Kefîsor.

Rojekê dayika wê gotê:

- Ka were vir, Kefîsorka min! Ev pirtek kêkê ye û hin tiştên dî jî yên xweş pê re ne, bilezîne wan ji dapîra xwe re bibe! Ew nesax e û pêdivî bi xwarina saxlemker heye. Niha zû herre hê hewa zêde germ nebûye. Û li xwe hişyar be dema di nav daristanê re derbas dibî û bi rêyê ve bimeşe daku hinda nebî û zembîl jî nekeve. Û ji bîr neke: ji dapîrê re bibêje "Rojbaş!" û ranebe tila xwe bike di nav her tiştî re!

- Ez ê tam wek te gotî bikim, Kefîsorê soz da diya xwe.

Dapîr dûr li nav daristanê dijiya, qederî nîv saetê ji gund. Hê li rexê daristanê gurek pêrgî Kefîsorê hat. Lê Kefîsorê ti hay jê nebû ku gur lawirek şûm e lew nizanî jê bitirse.

- Rojbaş, Kefîsorê, gur silav dayê.

- Rojbaş, rojbaş, guro, Kefîsorê bersiv dayê.

- Kû ve vê serspêdeyê, Kefîsorê?

- Ez ê çim mala pîrê.

- Çi ye di zembîla te de di bin pate ve?

170

- Kêk û xwarinên din yên xweş in. Me duhî nan pat, û ez ê hinan ji pîrê re bim çiku ew nesax e û bêtaqet e.

- Ka bêje, Kefîsorê, dapîra te li kû dijî?

- Ta mala wê hê bi qasî çarêkekê ji vir dûr e, Kefîsorê ravekir. - Xanîkê wê li bin sê dargûzên mezin e, û li wir hin devî û terraş jî hene. Jixwe noke tu wî cihî dizanî.

Gur di dilê xwe de pûnijî: - Ca ev keçik çi pariyek xweş e. Lê ger ez têra xwe fêlbaz bim, hem ew û hem jî ya pîrejin ji min re ne.

Kêlîkekê ew digel Kefîsorê meşî û paşî gotê:

- Tu dizanî, Kefîsorê, çiqas gulên delal li nav daristanê şên dibin? Çima tu qet li derdorî xwe nanerî? Wa diyar e tu ta nabîzî ka çivîk çend şirîn distirin. Tu wa bilez î dibê diçî dibistanê lê li vir li nav daristanê pirr xweş e.

Kefîsorê li derdorî xwe nerî. Tîrêj di nav çeqên daran re dilîstin, û erd bi gulên rengîn hatibû niximandin. - Bêguman pîrê dê kêfxweş bibe ger destek gulan jê re bibim, Kefîsor pûnijî. - Jixwe niha hê pirr zû ye û ez ê di dema xwe de bigim bineciyê.

Û Kefîsor ji ser rêya xwe bezî nav daristanê. Dema wê kulîlkek xweşik diçinî, yek hê xweşengtir li dûrtir bi ber çavan diket. Ew paşûpêş dibizirî û her kûrtir diçû nav daristanê.

Lê gur firtek li xwe da û xwe gihand xanîkê pîrê û derî qutî.

- Ew kî ye? dapîrê pirsî.

- Kefîsor im, gurî bersivand. - Ez ji te re kêk û tiştên dî yên xweş diînim. Ka derî veke!

171

- Destikê derî bade! dapîrê bang kirê. - Ez pirr bêtaqet im û nikarim ji nav nivînan derkevim.

Gur destik bada. Derî vebû, û bêyî ti bibêje gur xwe virr avêt dapîrê û ew daqurtand ûrê xwe. Paşî wî cilên dapîrê li xwe kirin, kefiya wê kir serê xwe, çû di bin nivînan ve û perde dan ber.

Di heman demê de Kefîsor li nav daristanê bezîbû û destek gulan yê wa mezin berhev kiribû ku êdî nedikarî hilgire ger mezintir ba. Paşî ew meşî mala dapîrê. Bo wê tişteyê seyr û sosret bû ku derî vekirî bû, û wek din jî xanîkê dapîrê li ber wê xerîb dixwiya. - Wey li minê, ez îro çend ditirsim, ew pûnijî. - Bi gelemperî mala dapîrê xweş e û bi kêfa min e lê çima niha

wiha ye.

- Rojbaş, pîrê, wê got. Ti bersiv nehatin bîstin.
- Kefîsor çû ber doşeka dapîra xwe û perde ji ber vedan. Dapîr li wir paldayî bû, kefî li ser çavan bû û pîr ecêb dixwiya.
- Lê pîrê, Kefîsorê pîrsî, çima guhên te wa mezin in?
- Daku dengê te baştir bibîzim, gur bersiv da.
- Lê pîrê, çima çavên te wa mezin in?
- Daku te baş bibînim.
- De çima destên te wa mezin in?
- Daku bikarim te baş bitepînim.
- Lê pîrê, ka bêje, çima devê te wa mezinî erjeng e?
- Daku bikarim te pê bixwim.

172

Û di heman demê de gur firt xwe ji nav nivînan deravêt û Kefîsorka reben daûrand.

Gurê zikdagirtî dîsan çû di nav nivînan re, di xew çû û tavlê dest bi pixe-pixek bêqam kir.

Wa çêbû ku nêçîrvanek di ber wir re borî. - De welle pîrejînikê xurt dipixe, ew pûnijî. - Divê biçim lê binerim ka derdê wê çi ye.

Yê nêçîrvan çû hindirrî xanî. Dema giha ber nivînan, dît ku îşte gur e yê dipixe.

- Ca ez li esmanan li te digirim, tu li erdê bi dest min dikevî, hey gurê gurî! yê nêçîrvan pûnijî.

Wî tifeka xwe hilda lê di heman bîskê de ket serî ku belkî gurî pîrejînik xwariye û dibe ew niha dikare bêt filitandin. Wî fîşek li gurî neteqand lê li şûnê meqes anî û dest bi dirrandina zikê gur kir. Piştî ku hinek jê dirrand, kefîkek sor diyar bû û paşî keçîkê xwe ji zikê gur avêt û got:



- Wey, ez çend tirsîm! Û çend tikîtarî bû di zikê gur de!

Paşî dapîr jî ji zikê gur hat deranîn. Ew sax bû tevî ku bên bi ser ketibû jî.

Lê Kefîsor bi lez û bez çû hin ber û kevirên giran anîn û zikê gurî bi wan dagirt. Û paşî dema gur şiyar bû û xwest bi rê bikeve, kevirên di zikê de wa giran bûn ku ew tavalê şewişê erdê û li wir mir.

Û hemû kêfxweş bûn. Pîstê gur bû para yê nêçîrvan, û dapîrê jî kêka Kefîsorê înayî xwar û pê sax bû. Lê Kefîsor pûnijî:

- Êdî bi tenê qet ji ser rêya xwe neçe ger dayikê li te qedexe kiribe.

173

Berfîn

Jacob û Wilhelm Grimm

Carekê li nîveka zivistanê wa qewimî ku dema berfa nerm mîna perrên teyr û tilûran ji nav ewran dibarî, şabanû rûniştî bû û kêlî dikirin li ber pencereya xwe ya milbendên wê ji dara reş ya ebonî.

Dema wê li wir kêlî dikirin û di pencereyê re li derdorî xwe dinerî, wê derziyek kir di tîla xwe re, û sê dilop xwîn jê darijîn ser berfê. Dilopên sor li ser berfa spî wa xweşik dixwiyan ku şabanû pûnijî:

- Wey, xwezî min zarrokek heba, spî wek berfê, sor mîna xwînê û reş şibî dara ebonî!

Piştî kurtedemekê keçikek jê re çêbû ku leşê wê mîna berfê çûrr, gepên wê wek xwînê sor û pirça wê şibî dara ebonî reş bû lew navê keçikê kir Berfîn. Lê mixabin dayika wê zû piştî welidîna keçikê mir.

Piştî salekê paşa dîsan zewicî. Şabanûya nû pîrr spehî bû lê herwiha pîrr zordar û pozbilind jî bû. Wê tehemil nedikir ku ti kes ji wê bedewtir hebe. Wê neynikek sihrî hebû, diçû ber û jê dipirsî:

Bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e.

Neynikê bersiv dida:

Şabanû ya spehîtirîn e.

Hingê şabanû dilşad dibû çiku wê dizanî ku neynik rastiyê dibêje.

174

Lê Berfîna biçûk mezin bû û roj bi roj narîntir dibû. Li heftsaliya xwe ew rind bû wek roj û ronahiyê, spehîtir ji şabanûyê bi xwe. Dema şabanûyê carekê ji neynikê pirsî:

bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e,

neynikê bersiv da:

tu bûyî berê bênimûne,

niha Berfîn ya spehîtirîn e.

Vê bersivê şabanû wa bextreş kir ku ew ji çavnebarî zer û kesk bû.

Ji hingê ve şabanûyê ji Berfînê nefret dikir. Kumreşî û hesûdî roj bi roj lê zêde bû û dilê wê dagirt û şabanûyê bi şev û roj hedan û aramî nedît.

Rojekê wê bangî nêçîrvanekî kir nik xwe û gotê:

- Keçikê bibe dûr nav daristanê, hew dikarim tehemila wê bikim. Divê wê bibî bikujî û dilê wê û zimanê wê bo min bînî daku piştrast bibim ku ew miriye.

Yê nêçîrvan bi gotina wê kir û Berfîn bir nav daristanê. Lê dema wî kêra xwe derxist, keçikê dest bi girî kir û gotê:

- Wey, nêçîrvanê rind, min nekuje! Ez ê birevim nav dehl û dirrên tarî û êdî ti car venegerrim malê.

Spehîtiya Berfînê nêçîrvan hejand, û wî got: - De ji xwe re bireve, rebenê.

Nêçîrvan ji xwe re pûnijî: Jixwe lawirên dirrinde dê aniha wê bixwin. Lê dîsan jî ji wî re dixwiya ku kevirek giran ji ser dilê wî rabûye madem ne neçar e wê bikuje.

Hingê gîskexezalek çargavî nêzî nêçîrvan. Nêçîrvan ew kuşt, dilê wê jê deranî, zimanê wê jê kir û bo şabanûyê birin.

Lê Berfînoka reben tikîtenê li nav daristanê mabû. Ew wa ji ser hişên xwe çûbû ku li pelên hejok yên daristanan dinerî û nedizanî kû ve biçê. Paşî wê dest pê kir bezî û di ser kevirên tûj re, di nav teraşên têstrî re meşî. Lawirên dirrinde yên daristanê di ber wê re diborîn lê ti zîyan nedigihandê. Ew bezî ta ku êdî piyên wê xwe li ber negirtin û ta tarîtiya êvarê daket. Hingê xanîkek bi ber çavên wê ket û ew çû têve.

Di xanîk ve her tişt biçûk lê pak û bijûn bû. Li nîveka wê mêzeyek biçûk û li ser mêzeyê jî mêzerek sîs hebû. Li ser mêzerê heft sênîkên biçûk û li ber her sênîkê jî kefçîkek, kêrikek, çetelkek û kûpîkek şîrî hebûn. Li ber dîwar li rêz heft doşekok û li ser her doşekê lihêfkek û çarçevêk sîs-spî hebûn.

Berfîn hem bîrsî û hem jî tî bû. Wê piçek nîsk ji her sênîkê xwar, kerîkek ji her pirta nanî ve kir û du-sê çip şîr ji her kûpîkî vexwarin çiku wê nedixwest hemû para ti kesî bixwe yan vexwe. Û ji ber ku ew pîrr westîbû, dilê wê kir rabe binive. Lê ti ji wan doşekan kêrî wê nedihatin. Ya yekem dirêj, ya duyem kurt, ya sêyem req, ya çarem teng bû. Taliyê ew giha doşeka heftem û dibê qey ew tam bo wê hatibû çêkirin. Berfîn hilket ser wê, duaya êvarê xwend û di xew çû.

Bi şev vegerrîn xwediyên malê, heft bejnboşt yên bi roj diçûn çiya kanzayan bikolin. Wan heft fanosên biçûk hilkirin û tavi lê pê hesîn ku kesek hatibû xanîkê wan ji ber ku her tişt ne wisan bû wek dema ew ji wir çûbûn.

- Kî li ser kursiya min rûniştîye? yê yekem pîrsî.

- Kê ji sênîka min xwariye? yê duyem.

- Kê ji nanê min diziye? yê sêyem.
- Kî ketiye ser sênîka nîska min? yê çarem.
- Kê çetela min bi kar aniye? yê pêncem.
- Kê bi kêra min birriye? yê şeşem.
- Kê ji kûpê min vexwariye? yê heftem.

Paşî yê yekem li dor xwe nerî û pê hesî ku şûndewsek li doşeka wî hebû.

Ew qîrrî: - Kê li ser doşeka min xwe pal daye?

Bejnbostên din jî li doşekên xwe nerîn. - Kesekî xwe li ser doşekên me jî dirêj kiriye! wan hemûyan hêbetmayî got.

Lê dema mêrkokê heftem bezî ber doşeka xwe, wî Berfîn li ser dît û gazî yên din jî kir. Hemû bejnbost li dor wê doşekê civîn û fanosên xwe bilind kirin ta ku ronahî ket keçika di xew.

- Çi ecêb e, çî seyr û sosret e, keçikek çend naz û nazenîn e! ew bi yekdengî qîrrîn.

Û kêfa wan wa hat ku wan nexwest Berfînê şiyar bikin lê hêla ew bo xwe binive. Bejnbostê heftem, yê ku keçik li ser doşeka wî razayî bû, her saetekê li ser doşeka yek ji hevalên xwe raket ta ku şev li wan borî.

Spêdeyê Berfîn rabû. Dema wê her heft mêrik dîtîn, pîrr behecî. Lê bejnbost xweşheval bûn û navê wê jê pirsîn. - Ez Berfîn im, wê bersiv da.

- Tu çawan hatî xanîkê me? ew jê pirsîn. Berfînê ji wan re vegot ka çawan jinbava wê dixwest wê bikuje, çawan yê nêçîrvan ew sax hêlabû û çawan ew taliyê bi ser vî xanîkî hilbûbû.

Bejnbost jê pirsîn: - Ma tu dixwazî bermaliya me bikî? Tu dê xwarinê ji me re çêkî, nivînan biniximînî, cilan bişoyî, kêliyan bikî û her tiştî pak û

bijûn bikî? Ger tenê bixwazî, dikarî li vir bimînî û ti tişt dê ji te ne kêmbê.  
- Ji hemû dilê xwe dixwazim, Berfînê bersiv da. Ê ew li mala yê bejnbest ma.

Spêdeyan bejnbest diçûn çiyayan li zêrr û kanzayan digerrîn, û êvaran ew dihatin şivê û nivistinê. Berfîn bi roj li malê dima. Bejnbestên baş ew hişyar dikir û digotê: - Xwe ji jinbava xwe biparêze. Ew ê pê bihese ku tu li vir î. Nehêle ti kes bêt hindirrî malê!

Şabanûyê, ya ku texmîn dikir ku Berfîn miriye, bawer dikir ku êdî bi xwe bûye spehîtirîn jina hemû cîhanê. Rojekê ew li ber neynikê sekinî û got:

Bêje, bêje, awêne,  
kî ya spehîtirîn e.

Neynikê bersiv dayê:

Tu bûyî berê bêmimûne,  
niha Berfîn ya spehîtirîn e.

Ev ji vir dûr e,  
li nik mêrikên hûr e.

Şabanû pirr tirsî ji ber ku neynikê herdem rastî digot. Ango yê nêçîrvan şabanû xapandibû, û Berfîn hê jî sax bû. Şabanûyê dest pê kir bipûnîje ka çawan keçikê bikuje.

Piştî wê taliyê fêlek peyda kir, wê cilên etarek pîr li xwe kirin û rûyê xwe bi rengan tewizand daku kes wê nenase. Paşî ew di ser heft çiyayan re meşî xanîkê bejnbestan, li deriyê wan da û bang kir:

- Tiştên xweşik bikirrin.

178

Berfînê serê xwe di pencereyê re derxist û silav kir: - Rojbaş, xanima delal, tu çi difiroşî?

- Tiştên pirr narîn, çît û deziyên rengşirîn, şabanûyê bersiv da. - Ben û

dezî û qeytanên tevrenî bo kiras û fîstanan. Û wê eşyayê spehî nîşanî Berfînê da.

- Bêguman ez ê bihêlim ev hurmeta çê bêt malê ve, Berfîn pûnijî. Wê derî vekir û gulolikek deziyên delal kirrî.

- Keçika delal, cilên te çendî kirêt in! pîrebokê got. Ka were ez ê qeytanek xweşik bixim çoxikê te!

Bêyî ti xirabî bêt bîra Berfînê, ew li pêşberî şabanûyê sekinî û hêla ew qeytanekê lê bide. Lê pîretewtê kirasê wê wa lê şidand ku hema Berfîn dê

fetisîba û mîna mirî be ket erdê.

- De baş bi serê te hat, delalokê, şabanûyê got û lezî derê.

Berêvarê bejnboost vegerrîn malê. Wey, ew çend bizdîn dema wan dilbera xwe Berfîna delal li erdê zerik û bêruh dît! Lê dema wan keçik rakir, pê hesîn ku kirasê wê zêde şidandî ye û qeytana wî piçand. Paşî wê hilm û henaseya xwe anî û bir û hêdî-hêdî bi ser xwe ve hat.

Dema bejnboostan bihîst ka çi qewimiye, wan got: - Ew etarok ji bilî şabanûya şûm ne ti kes e. Dema bi tenê bî, ti kesî bernede hindirr!

Lê dema şabanû vegerrî malê, wê awirek da neynikê û got:

Bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e.

Neynikê her wek berê bersiv da:

179

Tu bûyî berê bînimûne,  
niha Berfîn ya spehîtirîn e.

Ev ji vir dûr e,

li nik mîrikên hûr e.

Şabanû ji qehrê sor û ji tirsê zer bû çiku ew tê giha ku Berfîn dîsan bi ser

xwe ve hatiye.

- Lê ez ê fêlekê lê bikim ku wê bi temamî biruxîne, şabanû ji xwe re pûnijî. Û wê bi hinêra xwe ya sihirbazî şeyek jehrî çêkir. Paşî wê dîsan xwe kir pîrejinek, meşî pişt heft çiyayan nik xanîkê bejnboştan, derî qutand û gazî kir:

- Tiştên baş bikirrin!

Berfînê serê xwe di pencereyê re deranî û gotê:

- Herre ser riya xwe. Nabe derî li ti kesî vekim.

- De hema binere ka min çi heye, pîrebokê got û şeyê jehrî nîşanî wê da. Berfîn wa pirr bû heyranî şe ku taliyê qane bû derî veke. Dema wan li ser bihayê şe li hev kir, pîretewtê jê daxwaz kir:

- Ka ez pirça te pirr delal şe kim!

Berfîna reben ti hay ji xirabiyê nebû lew bo dilxweşkirina pîrejinê bi daxwaza wê qane bû. Lê dema şe giha pirça wê, bandora jehrê dest pê kir

û keçik gêjbûyî ket erdê.

- Niha dawiya te hat, delalokê, pîretewtê got û zû çû ser riya xwe.

Baş bû ku zû bû êvar hat û yên bejnboş vegerrîn malê. Dema wan Berfîn li erdê dirêjkirî dît, taviê wan şik ji jinbava wê bir, dest bi

180

lêgerrînan kir û şeyê jehrî dît. Û di cih de ku şe ji nav pirça Berfînê hat hilkişandin, ew hat ser hişên xwe û vegot ka çi qewimiye. Bejnboştan şîret li keçikê kirin ku divê li xwe hişyar be û lê qedexe kir ku qet derî li ti kesî veke.

Di wê navberê de şabanû gihabû malê. Ew rikerast çû ber neynikê û wek adetî jê pirsî:

Bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e.

Lê neynikê her wek berê bersiv da:

Tu bûyî berê bênimûne,

niha Berfîn ya spehîtirîn e.

Ev ji vir dûr e,

li nik mêrikên hûr e.

Şabanû ji kerb û kînan lerizî û recifî dema ev gotin bihîstin. - Ta ger serê min jî bêt lêdan, divê Berfîn bimire.

Paşî wê xwe vekişand çavîyeya xwe ya dizîkî ku nedihêla ti kes biçiyê, û sêvek çêkir ku tijî jehrek pirr xurt bû. Bi ser ve sêv wa delal bû, wa sor û spî bû ku kê ew dîtiba, dê dilê wî bibijiyayê lê her pirtek jî jê xwariba, dê bêçare miriba.

Dema sêv amade bû, şabanûyê rûyê xwe reng da, cilên jinek gundî li xwe kirin û çû xanîkê yên bejnboş yê li pişt heft çiyayan.

Wê derî qutand. Berfînê serê xwe di pencereyê re derxist û got:

- Newêrim derî li ti kesî vekim. Yên bejnboş li min qedexe kiriye.

181

- De bi kêfa te ye, jinikê got. - Jixwe ez dikarim van sêvan li derek din jî bifiroşim. Lê de bo tam ha vê yekê ji te re.

- Na, Berfînê gotê, newêrim wergirim.

- Çi, ma tu ditirsî? pîrejînikê hawar kir. - De binere, ez ê sêvê bikim du ker. Kerê sor ji te re û ez ê kerê spî bixwim. Jixwe sêv wa hinêrane hatibû çêkirin ku tenê alê sor jehrî bû.

Dilê Berfînê pirr çû sêva spehî, û dema wê dît ku jinik kerekî jê dixwe, êdî wê xwe ranegirt û destê xwe dirêjî jinikê kir û qedê mayî jê wergirt.

Hê Berfînê pirtek ji sêvê negezandibû, mirî ket erdê. Şabanûyê bi çavên birqok lê nerî, bi bêterzî kenî û tinazî û tirraneyên xwe pê kirin:



- Ey ya spî wek berfê, sor mîna xwînê, reş şibî dara ebonî! Vê carê yê  
bejnbost dê nikarin te şiyar bikin!

Dema şabanû giha malê, wê ji neynikê pirsî:

Bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e.

Û neynikê bersiv da:

Şabanû ya spehîtirîn e.

Niha dilê hesûd yê şabanûyê rehet bû. Ew hind razî bû hindî mirovên  
hesûd bikarin razî bin.

Dema yê bejnbost êvarê vegerrîn malê, wan Berfîn li erdê dît. Bêna  
keçikê êdî nedihat û nedîçû; ew mirî dixwiya. Yê bejnbost ew rakir daku  
binerîn ka tiştek jehrî lê bû. Wan cilên wê vekirin, pirça wê şe kir û ew bi  
182

av û meyavan şûşt. Lê ti tiştî pere nedikir: berdiliya wan niha bi rastî jî  
miribû.

Paşî yê bejnbost Berfîn danî ser darbestan. Hemû li dor wê kom bûn û  
bo wê girîn, sê rojan bênavberr bo girîn.

Paşî wan xwe amade kir ku Berfînê binax bikin. Lê keçik hê jî hênik û  
jîndar dixwiya û soriyek li gep û alekên wê bû tam mîna dema ew nivistî  
ba.

- Nabe em wê veşêrin bin axa tarî, yê bejnbost ji hev re got.

Wan tabûtek şûşeyî jê re da çêkirin daku bikarin ji her alî ve wê bibînin.  
Berfîn di tabûtê de hat bicihkirin û li ser qepaxa wê bi tîpên zêrrîn hat  
nivîsîn navê wê û ew yek ku ew keça paşa ye.

Paşî wan tabût hilgirt û bir danî ser lêva zinarekî, û herdem yek ji wan  
nobe lê digirt. Ta firrînde jî li tabûta Berfînê civîn daku li mirina wê  
bigirîn: pêşî kund, paşî qirrereşk û dawiyê jî kevok hat.

Heyamek dirêj Berfîn bi rehetî di tabûta xwe de paldayî ma. Ew qet neguherrî. Leşê wê hê spî bû wek berfê, gep û alekên wê sor mîna xwînê û pirça wê reş şibî dara ebonî.

Paşî rojekê wa qewimî ku kurrmîrek bi siwarî li nav daristanê digerrî û bo şevê hat xanîkê yên bejnbost. Wî dîtî tabûta şûşeyî li ser zinar, Berfîna tê de nivistî û tiştên li ser qepaxê nivîsandî. Wî got yên bejnbost:

- Vê tabûtê bidin min! Hûn çend pare bixwazin, ez ê bidim we.

Lê yên bejnbost gotê:

- Ger hemû zêrrê dinyayê jî bidî me, em ê wê nefiroşin.

183

- De pa madem wa ye, wê wek diyarî bidin min! kurrmîr daxwaz kir. - Ez nikarim bijîm ger li Berfînê nenerim. Dixwazim ta hebin rêzê lê bigirim û wê biparêzim.

Dema yên bejnbost gotinên yê kurrmîr bihîstin, dilê wan gelek bi wî şewitî û tabût dayê.

Yê kurrmîr ferman da peyrewên xwe ku tabûtê hilgirin ser milê xwe. Lê de binere ka çi lê hat: dema yên hilgir dimeşîn, ew li qurmê darekê hilingivîn, û hingê pirta sêvê ya jehrî ji gewriya Berfînê vebû. Piştî bîskekê wê çavên xwe vekirin, rabû rûniştinê û matmayî pirsî:

- Ez li kû me?

- Tu li nik min parastî yî, yê kurrmîr got û ji kêfan geş bû.

Û piştî ji Berfînê re hemû got ka çi qewimiye, yê kurrmîr hêvî jê kir:

- Li ber dilê min tu ji hemû malê dinyayê şirîntir î. Bibe jina min û li gel min were keleha bavê min.

Berfîn qane bû, û dema ew gihan mala yê kurrmîr, dest bi amadekariyên dawet û dîlanek şeng û şahane hat kirin.

Jinbava Berfînê jî hat vexwendin dawetê. Piştî wê bihagirantirîn cilên xwe

li xwe kirin, ew li ber neynikê sekinî û jê pirsî:

Bêje, bêje, awêne,

kî ya spehîtirîn e.

Û neynikê bersiv dayê:

Tu bûyî berê bênimûne,

niha bûk ya spehîtirîn e.

184

Şabanûya şûm wa qehirî ku êdî nizanî ka çi bike. Pêşî biryar da ku neçe dawetê lê taliyê her nikarî daxwaza xwe ya dîtina bûkê. Lew ew çû dawetê lê dema hat salonê û tê derxist ku bûk Berfîn e, wa qehirî ku ji kelehê bazda, û piştî hingê êdî ti hay ji wê nebûye.

Wergerandin: 01/2004

185

Xwelîser

Charles Perrault (1628 - 1703)

Carekê zelamek hebû yê jina wî mir û keçikek biçûk bo wî hêla. Piştî çend salan wî zelamî, ku dixwest keça wî bibe hevparî hezkirin û sereguhiya dayikane, dîsan bo xwe jinek anî. Ev jina wî bîjin bû û du keçên têrtemen hebûn. Lê ev jin zor û zalim bû û keçên wê jî ji wê bi xwe kembaxtir bûn. Keçika me ya reben di nav van xizmên xwe yê nû de ketibû belayên mezin. Zirrxwişkên wê hesûdî pê dibir çiku keçik pirr spehî û delal bû û zirrxwişk kirêt bûn. Çi ji destê wan hatiba, wan fikir daku keçikê xemgîn bikin. Taliyê ji ber hesûdî û çavnebariya wan jiyana keçikê lê bû barek giran. Wan hemû xwarin bi keçikê dan çêkirin û aman pê dan şûştin. Ji ber ku keçik bi şev û roj di nav tenî û xweliyê de bo wan dixebitî, wan navê wê kir Xwelîser.

Paşayê wî welatî tenê kurrek hebû. Bo paşayî pirr giring bû ku kurrê wî bo xwe jinekê bîne lew wî govend û dîlanên mezin li dar xistin û bangî hemû keç û zeriyan welatê xwe bang kirin daku kurrê wî yek bi dilê xwe ji nav bibijêre. Şahiya wan dê pirr xweş ba û dê sê rojan vekêşaya û hemiyar dixwest biçinê ji ber ku wan dizanî ku dê kurrmîr bo xwe dezgirekê ji nav wan bibîne.

Zirrxwişkên Xwelîserê jî hatin vexwendin. Jin hingê pêve wan ji bilî krias û fîstanên xwe bas ti tiştî nedikir çiku her yekê ji wan bi dizîkî hêvî dikir ku kurrê paşayî wê bistîne.

Dema roja mezin taliyê hat, wan hê zû piştî taştê dest pê kir cilên xwe li xwe kirin. Diviya Xwelîser alîkariya wan bike. Hemû rojê wê pirçên wan şe kirin û bo wan ji vir dibezî wir û di xizmeta wan de bû.

186

Dema Xwelîserê cilên wan yên ciwan dîtin, dilê wê jî çû govendê. Lê dema wê bi şermokî ji xwişkên xwe xwest ku bihêlin ew jî li gel wan biçê, wan henekên xwe bi wê kirin û pê kenîn.

- Tu û govend? xwişk lê qîjîn. - Ca tu dê li dawet û dîlanan çî bikî, perritiyokê, lewitiyokê! Na, na Xwelîserkê, tu vegerre nav tenî û xweliyê

-

ew xweş cih e bo te û pindiloşkên mîna te.

û paşî zirrdayik û zirrxwişk bi erebeya li dû du hespan ajot keleha paşayî, û Xwelîser li malê hat hêlan. Ew rûnişt ber agirê kuçkî û dest pê kir hêdîka bo halê xwe girî çiku wê hest pê kir ku pirr xemgîn û bêkes e.

Dema ew li wir rûniştî bû û agir li dor wê gurr bû, wê bihîst ku dengê bangî wê dike:

- Xwelîser, Xwelîser!

Keçikê xwe hilavêt daku binere ka kî ye bangî wê dike.

Li ber kuçkî li pêş wê pîrejineka xwe spartî gopalê xwe hebû. Ebyayek dirêjî sor li ber bû, cotek pêlavên binbilind li piyan û kumek reş li serî. Xwelîserê nikarî bizane ka ev jina nenas ji kû ve hatiye, ne bawer e ku di pencereyê yan derî re çiku herdu jî girtî bûn.

Xwelîser ecêbgirtî ma lew dev ji giriyê xwe berda û rik li wê jinikê nerî.

- Çima digirî? pîrejinê jê pirsî.

- Ji ber hindê digirîm ku dayik û xwişkên min çûne dawet û dîlanan û ez li vir hêlame, Xwelîserê got.

- Ma tu jî dixwazî biçî govendê? pîrê pirsî.

187

- Belê, dixwazim lê ti bêmifa ye çiku min ji bilî kincirrên perritî ti cil nînin li xwe bikim, Xwelîsera reben kinkinî.

- De ka negirî, keçikê, pîrejinê ji dil gotê. - Ez perî me, parêzera te me.

Ger wek ez dibêjim bikî, belkî bikarî biçî dîlanê. Niha bibeze nav bûstanî û bo min xiyarekî bîne.

Xwelîser bezî nav bûstanî û mezintirîn xiyarê dît anî.

- Niha herre xefika mişkan ji bindavê bîne, parêzerê gotê. Xwelîser beziyê.

Şeş mişk ketibûn xefikê. Pîrejinê ew xistin pêşiya xiyarî, koremişk kir ajovan û du margîsok li piştê bi cih kirin û paşî destê xwe li raserî wan anî û bir. Hevdem xiyar bû erebeyek pirr şeng û şirîn, mişk bûn şeş hespên spehî, koremişk bû ajovanek xweşeng û margîsok bûn du xizmetkarên dirêj yê porrê wan dondayî û goreyên wan armûşî bûn.

- De va ye, pîrejinê gotê, - ev e erebe daku pê biçî.

- Ax, Xwelîserê got, - ma ez ê çawan biçim govendê! Min ji bilî van cilên kincirr ti nîne!

- Tenê ew? periyê jê pirsî. Wê destek xwe hejand, û kincirrên Xwelîserê bûn delaltirîn cilên cîhanê ku her cûn zêrr û zîv û zirzirrok û

pirrpirrokên bihagiran pê ve dibiriqîn. Morîk û mircan bi pirça Xwelîserê ve çêbûn, û li piyên wê şeng û şirîntirîn şimikên şûşeyî bûn.

- De niha, pîrikê gotê, - niha dikarî biçî govendê. Lê ji bîr neke, berî saet dozde vegerre çiku ger derengtir bimînî, hemû şengiya te dê berze bibe û

cilên te dê bibin kincirrên perritî.

Xwelîserê soz da ku bi şîretên pîrika xwe bike. Paşî ew rûnişt di erebeyên spehî de. Xizmetkarê wê derî girt, ajovan şiva xwe veweşand û hesp berev cihê govendê bi rê ketin.

188

Li hemû eywan û serayê xelk mat û heyirî ma dema keçik giha wir. Dê mê wisan şirîn û erebeyên wa şeng qet nehatibûn dîtin lew her kes diramî ku divê ev keçik dotmîrek be ji dûristanê hatibe.

Hemû berdestiyan û mêvanan xwe da alî daku rê bidin wê. Dema kurrmîrî ew dît, di cih de dil ketê. Hemû êvarê ew li gel Xwelîserê dansî. Di dilê xelkê de ti guman nema ku kurrmîrî dê wê bibijêre daku bibe hevsera wî.

Şîreta pîrikê ji bîra Xwelîserê neçûbû lew wê dozde kê m çarêkekê xatir ji kurrmîrî xwest û bi rê ket.

Ew tam berî saet zengila dozdeyê lê bide giha malê. Hevdem hesp bûn mişk, ajovan koremiş, xizmetkar margîsok û erebe xiyar. Dema xwişkên wê hinekî derengtir gihan malê, Xwelîser di kirasê xwe yê perritî de li nav xwelî û teniyê rûniştî bû.

Dotmîra xerîb ya hatibû dawetê pirr bala xwişkên Xwelîserê yên kirêt kêşabû. Hemû roja din ew li ser wê dipeyivîn bêyî ku wan ti hay jê bibe ku ew zeriya bedew xwişka wan ya kêmqedirkirî Xwelîser e.

Êvarê, dema xwişkên Xwelîserê dîsan çûn govendê, tam wek cara berê

perî hat nik wê. Dîsan Xwelîser bi erebeyê çû kelehê, vê carê bi cilên hê xweşikîr. Hemû wê êvarê jî kurrmîr bi wê re reqisî.

Lê êvara sêyem kêfa Xwelîserê hind xweş bû ku şîreta pîrikê qet nehat bîrê ta wê tawilê bihîst ku zengila saet dozde lê dide. Hat bîrê ku tam wê bîska zengil bi dawî bêt, cilên wê yên ciwan dê bibin kincirr lew wê bi lez û bez ji dîwanê bazda. Kurrmîr li pey bezî daku bigihiyê. Xwelîser ji tirsan wa zift revî ku kitek şimika wê ya biçûk ji piyî ket.

189

Kurrmîr sekinî daku şimika ketî rake. Xwelîser jê filitî lê jixwe dem bû jî. Tam dema ew ji hewşa kelehê derket, zengilan hew lê da û pê re jî hemû şengûşoxiya wê hinda bû û dîsan kevnekirasê wê li ber ma.

Dema kurrmîr giha nêrdewanên kelehê, êdî dewş jî ji dotmîra narîn nemabû. Dergevanan dizanî ti kes derneketiye, ji bilî keçikek xidam ya bi kincên rîçalok. Kurrmîr neçar bi tenê vegerre nav govendê, pê re tenê kitek şimika şûşeyî wek bîranîn ji zeriya zerîesmer ya dilê wî bi neçarî ketibûyê.

Roja din paşayî hemû peyamber û daholqutên xwe şandin daku ragihînin ku kurrê paşayî dê li gel wê keçê bizewice ya ev şimikê kêrî piyê wê bêt. Lê tevî ku hemû jinên wî welatî xwe li şimikê cerriband, ew kêrî wan nedihat - piyên wan pîrr mezin bûn!

Taliyê peyamber hatin wî xanî yê Xwelîser lê dijiya. Pêşî zirrxwişka wê ya mezin şimik cerriband lê qet ne gengaz bû biçe piyan çiku pêçiya wê ya mezin zêde gir bû. Hingê diya wê, ya ku bi coşî li cerribandina keça xwe dinerî, kêr da dest wê.

- Tila xwe ya mezin bibirre, wê gotê, - ca çi ye ger seqet bî madem jina kurrê paşayî bî, jixwe dê her bi erebeyan bigerrî.

Xwişka mezin pêçiya xwe birrî lê bêwec bû, şimik bivê-nevê mezin bû lew

taliyê wê dest jê berda û raberî xwişka xwe kir.

Lê bextê xwişka din ne ji yê wê spîtir bû. Erê cihê tilên piyê wê tê de hebû lê paşpanî nediçû tê de. Dayikê xwest ew paşpaniyê bibirre.

- Ca bo çi ye? wê gotê. - Dema jina kurrmîrî bî, ne hewceyî piyan î.

Lê dema wê paşpaniya xwe birrî, şimik êdî zêde mezin bû û kêr nehat lew taliyê wê jî şimik hêla.

190

Xwelîser bi şermokî hat ji pişt derî yê ku wê xwe lê veşartibû û pirsî ka ew dikare şimikê bicerribîne. Zirrdiyik û -xwişk pirr lê enirrîn û xwestin bi lêdan û qutan wê ji wir derbixin lê peyamberan rê nedayê.

- Kurrmîr dixwaze her keç û jina welatî şimikê bicerribîne, wan got û ji Xwelîserê xwest ku rûne û bike piyê xwe.

Û şimik tam kêr wê dihat!

Dema hemû li Xwelîserê civîn, wê kita din jî ya şimikê ji berîka xwe deranî û kir piyê din. Hê ew baş negihiştibû wa bike jî ku kevnekirasê wê lê bû taximek cejnane û ew bû ew zeriya spehî ya dilê kurrmirî li govendê ketibûyê.

Kurrmîr ji kêfa ji hal çû dema ew dît. Wan dawet û dîlanên mezin û şahane kirin.

Lê zirrxwişkên wê wa diqehirîn ku hema dê ji kerb û kînan peqîban. Roj bi roj ew kirêttir bûn ta dawiyê ew wa erjeng dixwiyan ku êdî kesî dil nedikir lê binere. Lê Xwelîser her spehîtir dibû û hemû jiyê xwe jiyaneke bextiyarane li gel kurrmîrî borand.

Wergerandin: 12/2003

191

Rûvî û qirrereşk



Aisopos

Rûviyekî dît qirrek (qijikek) li ser çeçek darê ye û pariyek xweş yê xwarinê di devî de ye, û av bi ser zimanê rûvî ket. Lê gelo rûvî çawan wî parî ji qirrê bixîfîne?

- Ey çengdara pîroz! rûvî bang kirê, - ey firrindêya spehî li ber çavên mirov û xwedayan!

Paşî rûvî pesna şîrîniya qirrê, delaliya perr û baskên wê, hinêra pêşbîniya wê û hêjayiyên wê yên dî dan.

- Ê ger, rûvî domand, - dengê te jî wek taybetmendiyan te yên din jêhatî be, tava rojê jî ne wek te geş e.

Vê pesndanê wa kir ku qirrê lixavên xwe vekirin daku hinêra xwe ya stranbêjiyê nîşanî rûvî bide. Lê dema devê wê vebû, di cî de pariyê wê ji devî ket, û rûvî ew parî daqurtand.

Paşî rûvî got qirrê: - Min çend pesna delaliya te dabe jî, min bi peyvekê jî ti basa hişmendî û aqildariya te nekir.

192

Rûvî û masîgir

Hebû nebû, carekê masîgirek hebû. Wî rojek zivistanê serberfkêşka xwe tijî masî kiribû. Bi dilek xwe mêrik berê xwe da malê. Bi rê ve ew ji dilşadiya xwe stranên kêfî distirandin.

- De ev çi ye li ser rê paldayî? Rûviyek mirî ye!

Mêrikî hespê xwe sekinand û çû nik rûvî. Wî rûvî rakir û danî ser aliyê piştê yê barê xwe yê masiyan û bi xwe li pêşiyê rûnişt. Ca çi kêfa mêrik dihat, wey hawar!

- Kurkê te yê delal, rûvîkê reben, ez pirr hewce me. Ez ê wî bihagiran firoşim, mêrikî ji xwe re digot.

Lê rûviyê fêlbaz qet nemiribû. Kêlîkekê wî xwe li ser barî mit û kirr kiribû.

Paşî wî cambazî dest pê kir masî bi rê werkirin. Tawilê serberfkêşk bervalala kir. Taliyê rûvî xwe jê avêt û nêçîra xwe berhev kir. Bi dilxweşî wî masiyên tamxweş didan ber dev û lixavên xwe. Firavînek wa çêjdar ev demek bû bi dest Rindoyî neketibû. Yê ji ber mayî jî wî varê kirin û binberf kirin bo dema pêdivî.

Mêrik hemû demê bi ti tiştî nehesîbû, li ser barê xwe rûniştibû û stran digotin. Dema ew giha ber malê, jina wî hat pêş ve.

- Tu li kû bûyî, mêriko, demek wa dirêj?

- De giliyan neke, jinê! Serberfkêşka min miştî masî ye û min rûviyek rind jî aniye. Min ew mirî bi rê ve dît.

Jinik ecêbgirtî li serberfkêşkê nerî lê jixwe ew vala bû.

- Ma tu dîn bûyî, mêriko! Ka masiyek tê de nîne, ca ta rûvî tê de be!

193

Mêrik pirr ket şermê. Wî serê xwe xwirand û got:

- Welle wa ye. Aniha tê digihim ka wî hîlebazî çî bela anî serê min!

Çîrokek gelêrî ya fînlandî

194

Sê çîrokên kurt

Aisopos

Stêrnasek

Stêrnasek her êvar diçû derve û li stêran dinerî. Dema carekê ew dîsan bi rê ve bû berev derveyî bajar, wî berê xwe dabû esmanan lew hilingivî û ket bîrekê. Rêborekî guh li hawar û gaziyan wî bû, çû nik û gotê: "Wey rebeno! Hind bi sexbêrî li diyardeyan esmanî dinerî ku haya te ji yê sererdî namîne."

Şêr, ker û rovî

Şêrekî, kerekî û roviyekî li hev kir û çûn nêçîrê. Dema wan têra xwe nêçîr kir, şêrî got kerî: "Nêçîrê parve bike." Kerî her tişt kir sê pişkên wekhev û tika kir her yek para xwe rake. Lê şêr xeyidî û ker xwar. Paşî şêrî got rovî: "Nêçîrê dabeş bike." Rovî hemû nêçîr kom kir, tenê çend pirtik bo xwe jê rakirin û hemûya dî bo şêrî hêla. Dema şêrî jê pirsî ka rovî ji kê wa elimiye, rovî got: "Ji bextê reş yê kerî."

Du beq

Dema av ji lîça jîngeha du beqan hişk bû, ew bo xwe li lêgehek nû gerrîn. Wan bîrek dît û yekê got: "Divê em xwe biavêjinê." Lê ya dî got: "Lê eger ev jî ziwa bû?"

195

## SIWARÊN ÊŞÊ

Fawaz Husên

NOVEL

Fawaz Husen

WEŞANfeN WELAT

1994

Weşan: 11

siwarên êşê

Çapa yekem

©Favvaz Husen

Pergala berg û rûpelan: WW

Weneya berga peşîn: Edvard Munch

Çap: Li derveyê welet

ISBN: 91-97 21 97 -0-3

A AA SIWAREN EŞE

Fawaz Husen

\*\*\*

Fawaz Husên di 1953an de li Kurdo, nêzîkî Amûdê çêbûye. Ji sala 1978an heta 1992an li Parîsê maye. Lixwendegeha Sorbonnê xwendina xwe ya bilind kiriye û di sala 1988an de liser zîman û ferhenga fransî doktora xwe girtiye. Ûji sala 1993an û vir de li Swêdê dimîne. Siwarên Êşê pirtûka wî ya pêşîn e.

NAVEROK

SIWARENEŞE 7

BAŞOKE 25

QESRAXEWNAN 35

ROJEK WEK ROJEN DÎN .48

DERIYE VEKIRÎ .60

HAVINA SEYDO .74

TEVGEREKE BERÛMET .85

ÇEND WENE JI JIYANEKE PÎS .93

SERE KU HERDEM JI BÎR DİKIR 104

SIWARÊN ÊŞÊ

Avahiya îstegehe ji Behzad û hevale wî Seydo ve bi sî çil gavî dûtir bû le mije bema xwe le dipeçand û ew dûtir dixist. Behzad û hevale xwe ji deve metroya herî nezîkî îstegeha Gare de Lyone derketin û divatin, ta bigihaştana ber deve dergeha mezin, meydana di we navbere de derbas bikirana. Ew e U tireneke bi taybetî, tireneke ne wek hemû tîrenan siwar bibûna. Wan e di dane we roje de qonaxen durbûne li paş xwe bihiştana, demen sergûne ji bîr bikirana. Bi çend gotinen sade, Behzad e piştî salen xerîbiye, jiyana sehitiye biçûya male, vegerya günde xwe di navbera Qamişlo û Amûde de. Dema wî û Seydo meydana fireh birrîn û nezîktir bûn, perdeya

mije hinekî tenik bû. Behzad sere xwe bilind kir li îste-  
gehe nerî wek ku wî ji we û ji hemû bajar dixwest xatir  
bixwesta. Çaven wî li ser qelşen dîwaran, li ser rezen pencereyen  
camşikestî gerriyan. Wî li hawîrdora xwe meze kir û  
nerînen wî bi avahiye helkişiyân, li ser birca saete ravvestiyan.  
Di her çar rûyen birce de saetek mezin hebû û mîlen wan  
dixuyan ji demek direj ve ji dana wexte westiyabûn. Behzad li  
Seydo nerî wek ku wî dixwest bersiva wan eceban U ser eniya  
wî bi tipine stûr hatibûna nivîsîn. Ji herdu rewiyan tu gotin  
derneketin û wan bere xwe dan dergeha mezin, buhurîn  
hundire îstegehe. Reyen hesinî, li aliye din, beguman di nava  
mija deste sibehe û deren dûr de winda dibûn.  
Keviren reş û spî en çarnîçik li ser rûye erde ji paqijiye dibiriqîn.  
Ronahiya xurt ji lempeyen bane nizim dihat xware û  
di eyvvana flreh de belav dibû. Behzad jî, Xwede giravî, kar û  
baren xwe ji bo vegere kiribû, le eğer Seydo bi zore di bin  
çente û kîsen naylonî de diliviya, ew, bixwe, tene bi çenteyekî  
biçûk vedigeriya male. Solen herdu rewiyan li ser keviran ki-  
rin qurpequrp û di bedengiya deste sibehe de belav bûn.  
Hundire îstegehe pir fireh bû. Li ser dîwaren pehn, sureti-  
ne mezin pesne gelek tiştan didan. Li ser çendinan ji wan  
xwarine bereçekirî hebûn û xort û keçen bikef, xweşik ew dixwarin  
û kef û xweşikbûna wan pirtir û mezintir dibûn. Hin sûreten  
din pesne behnen Fransî en giranbuha, ava pişti  
rîkurkirine, merhemên dijî-qermîçokan, dijî-pîrbûyîne didan.  
Keçine ciwan, tazî, xwe li ser texten razane direj dikirin, bi  
revviyan re dibişirîn, bang wan dikirin, germiya hembez û ma-  
çan berdidan cane wan, bi bîra wan dianîn.

Behzad di ber sûretan re buhurî, ew sûreten ku bigiştî ji ber çaven wî winda bibûna. Hevale wî li dîvvaran nedmerî û di îstegeha Gare de Lyone de, bi tersî Behzad, bikef dixuya.

8

Ere, kefa wî U wî bû çûn ku piştî salen xerîbiye, dûrbûyîne, ew e ü tirena xwe sivvar bibûya, ji eşe tev biba. Di şuna wan sûretan de, m sûreten e û bave xwe, xuşk û birayen xwe, dost û hogiren xwe di sere xwe de çedikirin. Wî perçeyen jibîrbûyî bi evîniyek mezin didane hev. Wî gelek tişt di wan salen direj de ji bîr kiribûn, le hevdîtina nezîk weneya şadiye di dane we roje de di sere wî de fikir mîna desmalek hebirmeşî û li ba fikir.

Behzad nikarîbû awiren xwe ji wan posteren dîwarî bibirrandana. Sûretan didan dû wî, payen wî li ser keviren çarnîçik giran dikirin. Wan bi dawa wî digirtin, xwe U ber çaven wî mîna fîlîmekî sînemaye radbdstin, pehn dikirin. Jinen nazik, narîn û dilrevîn di guhen wî de tiştine xweş digotin û peymanen şadiyan di sere wî de diristin. Haya hevale wî ji tişteki nebû dema Behzad deste xwe li mile wî da û got:

- Seydo, here ciye me peyda bike. Hena betirî se çarîkan U ber me maye. Ez e çend tiştan ji bo ve reya direj bikirim û ez e xwe bigihînim te.

Seydo negot ne ere ne na û tene di nav diranen xwe de keniya. Ew bîst sî gaven din li ser maliken şitrence, lîstika qedere, meşiya û ji ber çavan ket.

Behzad bi تنها sere xwe di we eyvvana vala de ma, ji xwe re got ku bi rastî nezîkî saeteke hena li ber m mabû. Keçeke xwînşîrîn li ber dergeha U bajer dineri bala wî kişandibû û wî

xwest le vegeriya. Wî yek nekir didu û bi lez di nav ronahiya xurt re bere xwe da we.

Keça ciwan li ser qûma giraveke xwe ramidandibû. Roka havînek xweş, şaxen darek xurma û ava deryayek geh kesk geh şîn di bin asmanekî sayî de gihastibûn hev, ketibûn go-venda xweşikbûn û şadiye. Beguman keça bedew nû ji deryaya derketibû û dilopen ave bi hezaran li ser Îaşe spehî mîna mînvaran dibiriqandin. We bi nazikî, bi dilovanî şûşa Coca Cola nezîkî leven xwe dikir û dixwest di we buhuşte de hemû xweşiyen jiyane bikirana du se qurt. Ronahiyek germ, xweş, zerînî, bi tersî ronahiya spî û xurt ya zike îstegehe, xwe li we dipeçand, di ser Îaşe lîsî şayik re dişemitî. Ew li ser simten paşiyê û li ser sere memikan dîn dibû, ji kefxweşiyê hema dilerziya.

Li ber we periye Behzad rawestiya û hema le temaşa kir. Wî hena tiştêk ji bo reya direj nekirîbû û li ber rûyê biken, Îaşe lihevhatî, wî xwe di nava deriya daxwaziyan de kir, cane xwe avet nav pelen bextewariyê. Haya wî ji wexte nemabû dema ji aliye dergeha mezin, dengen payine hatin. Ew di tiyê xwe de veciniqî, üviya û kir wek ku ew ji xwe re li hundire îstegehe digeriya, U sûretan, li hemû sûretan temaşa dikir. Di we gave de çar miroven bi çilen reş buhurîn hundire eywane û bere xwe bi lez dan ciyê tîrenan. Wan tabûtek gelekî direj avetibûn ser milên xwe. Berrek kesk bi ser darbende dakirî bû û li ser we, bi tîpen erebî, çend ayeten Qurane hebûn. Behzad ayet ji hev dernexist, le wî zanîbû ew ayeta "La îlaha îllal Allah, Muhemmed resûlul Allah" bû. Ew her çar mirov di ber wî re buhrîn û U ser kevîren reş û spî bere xwe dan reyen

hesinî. Eywana îstegeha Gare de Lyone, di we navbere de ji Behzad re mîna xewneke xuya kir. Ew bû reya ku ji bajare Amûde ber bi herdu goristanan diçû. Wî deste xwe ber bi rûye xwe ve kir û destpe kir "Fatîhe" xwend. Ayeten peşî xweş hatin bîra wî, le tevî wî Quran xitim kiribû, bi salan çûbû ber mele, wî kir û nekir ew surete hane we roje bigîştî nehat bîra 10

wî. Wî mejiye xwe guvaşt, zor li xwe kir, le dua wî ji bo ye mirî di deve wî de nîvco ma û wî herdu desten xwe di ser rûye xwe re birin.

Eywana bi sûreten dîwarî, bi îlanen mezin bixwe ya biletfiroşan bû. Nezîkî bîst sî koşiken camkirî milen xwe dabûn hev le kesek li pist camen wan nedbcuya. Di nav wan dîvvaren pehn de, ne denge bargir û rojnamefiroşan dihat, ne pejna revviyan xuya dikir. Behzad ji xwe nepirsî cima hundire îstegehe wilo bedeng bû, le bixwesta nexwesta, wî dizanîbû ku ew derbasî nava jiyanek bi taybetî bûbû. Ere jiyanek bi taybetî ji ber ku vegeza wî jî bixwe bûyereke bi sere xwe bû, tiştêkî pir mezin bû. Wî ji xwe re got ku beguman ji ber ve yeke tişt tevlihev dibûn, diketin qalike xewnen şevan û îstegeh dibû wargeha eceban.

Piştî wan kesan û tabuta ser milen wan, Behzad nema dikarîbû li wî îlaşe li ser xîza nerm ramidandî bineriya. Wî jî bere xwe da tîrenan û reyen hesinî. Li derve, mije, wek dema ew ji metroye derket, xwe li îstegehe peçandibû. Mij stûr bû û tîren di nav de nedbcuyan. Le bele Behzad îstegeha Gare de Lyone nas dikir, dizanîbû ku û ser sînga we herdem tîren li keleka hev diketin reze mîna lavvîren gîredayî hema dikirin



pufepuf. Tiren li we dere bûn û we sibehe Behzad e li yeke ji wan sivvar bibûya û bi reya xwe ve biçûya.

Wî çend gav ber bi reyen hesinî ve avetin le piştî mije sermak xurt pergî wî hat. Wî bişkoken paltoye xwe girtin, dest pe kir di zike avahiye de li textereşen hatûçûya tirenan gerriya.

Textereşe ji bo çûyîne di zike siryaqe de bû le tu agahî U ser nexuyabûn. Mija xwe bi ser hemû bajar de wek cavvekî

11

dakiribû di nava îstegehe de xwe li her tiştî dipeçand. Behzad çaven xwe girtin û guhdarî kir. Dengek mîna denge zîpika û ser banen dikanen ji teneke û ber guhen wî peyda bû. Tîpen navan herdem bi dengê bilind li ser textereşe hatûçûye di bin bane îstegehe de didan dû hev. Hin bi hin welatan dan dû hev, naven wan ketin şuna hev. Nave bajaran di sere Behzad de xuya bûn: Wan û gola xweşik, Diyarbekir, keleha we, şoreşen we en tevnedibûn, Qamişlo û bazara genim, Amûd, ceme miçiqî, herdu goristanen hema firehtir, mezintir dibûn. Reya di navbera Qamişlo û Amûde de, giren bi keviren goran, xaçereka ber bi gund ve diçû jî, di nava mija dane sibehe de, di nava serma Parîse de xuya bûn.

Gerek bû Behzad numeroya tirene peyda bikira. Wî li saeta bazine deste xwe meze kir, ji xwe re got ku hena wext li ber wî pir bû. Baweriya wî bi Seydo dihat, dizanîbû ku wî ciyekî baş li keleka came peyda kiribû. Re pir direj bû û ciyekî baş li ber pencere giring bû. Tirene e di nava welatan de, mîna marekî hesinî, xwe xwaro maro bikira, bikira fişîn, dûrî axa serma û tenhayîye bibûya, ew e derbasî nava bîranînen xweş û nexweş, nava qiriktaliye jî bibûya.

Û hat bîra Behzad ku wî hena tiştê nekirîbû. Wî e çî bikirîya, çî nekirîya? Dile wî diçû her tiştî, diçû behnen fransî en giranbuha, xwarinen xweş, kincen bedew, şerab û sûlava mîna xwîne, mîna ramûsanen leven qîrmizî. Le wî dizanîbû ku wî nikarîbû bare xwe giran bikira û bi ser de jî pir pere bi wî re nebûn. Wî çbcareyek pexist û bi hilma peşî re hat bîra wî ku wî dixwest çend kiroz paket bikirîna. Wî pir jî çbcaren amerîkayî en qûnpembo hez dikir û gerek bû wî hesabe male û mevanan jî bikira. Ere, piştî wan salen pir li ware dûrbûne

12

hevalen kevn e bihatana, pîrsa gelek tiştan bikirana. Wan e behna Evropa rengin ji wî bikirana, bi çaye re çixare bikişandana. Wilo jî wî dest pe kir çaven xwe gerandin. Di her îstegehe de li bajare Parîse koşiken paketfiroşan û meyxane hebûn û wî ji xwe re got ku ew e di we îstegehe de jî hebûna. Ew ket nava gelek dalan û dehlîzan. Wî nizanîbû ku îstegeh wiqasî fireh bû. Ew dûrî tiye tîrenan ket, le car dî netirsiya ji hevale xwe an ji tîrena vegere bimaya. Wî li saeta xwe nenerî û bawer kir ku herdem wext li ber wî pir bû. Behntengiye ji destpeke, ji dema ku wî rahiştibû çente xwe û ji oda xwe derket, dabû tengala wî. Dema wî dukana paketan peyda nekir, behntegiye reya xwe dît û xwe avet nava wî. Behzad nikarî bû deh deqan xwe be tûtî ragirta. Wî ji xwe re got ku beguman du se paket di bine çente wî de mabûn le du se paketan tera çî dikirin? Wî xwe nas dikir û dizanîbû ku di we reya direj de, we betir çbcare bikişandana. Dema wî bernameyine tevlihev dida ber rûye xwe, wî çixare ü ser çixare dikişand û çûyîha welet, vegera bigiştî, tiştê pir tevlihev bû, di pirtûka jiyana

wî de rûpeleke nû bi hevok û risteyen zehmet bû. Ew di nava îstegehe de geriya, ji dereke çû dereke din, ji dalaneke ket dalaneke din, hat heviya xwe bibirriya, dema ji nişke ve, di derek hinekî tarî de, ew rastî mekîna xwekar ya paketan hat. Behzad, wek hemû çbcarekeşan, ew mekîne xweş nas diki-  
rin. Di sere kuçeyan de, li keleken sînemeyan, di taren bajar de, wan mekînan piştî girtina dikanan baş kar dikirin. Gelek caran piştî nîve şeve Behzad xwe H wan digirt û paketa xwe ji wan derdbdst. Di we îstgehe de kefa Behzad helbet pir hat û cizdane xwe vekir, hemû peren hûr amede kirin. Wî xwest bi kemani panzdeh bîst paket bikirîna. Wî deh firingen fransî en  
13

zer radan qelşa mekîne, hinekî xwe ragirt. Paşe, wî tûtina xwe helbijart, destike hesinî ber bi xwe ve kişand û paket rada de-  
ve çente xwe. Wî deh firingen din amede kirin le piştî derketina pakete, ew deh firingen wî ketin ber wî. Wî nas kir ku mekîne xerabe bû û we yeke kefa wî anî. Wî rahişt deh firing-  
en xwe, careke din ew radan nava mekîne, paketek din derxist. Cara duyem nezîkî deh duwanzdeh deh firingen zer û penc firingen spî ü ber nigen wî kom bûn. Behzad bi tirsek diyar li havvîrdora xwe niherî. îstegeh herdem vikîvala bû. Piraniya caran Behzad bawer dikir ku ew bextreş û beoxir bû. Wî wek gelek Kurdan digot ku eğer ew tî biçûya ser deriyaye, deriya e bimiçiqiya. Roja wî bbcwe bi avvayekî tevlihev dest pe kiribû. Le ke bîra we mekîna han û wan peren pir dibir? Behzad ere ji jiyana xwe li Fransaye ne xweş bû, le qîma xwe pe dianî. Ew bi we jiyane razî bû ji ber ku tu jiyanine din, xweştir, birûmetir, li ber rûye wî diyar nedibûn. Le dema me-

kîna paketan bû ya siûd û bexteweriye û dest pe kir ew dewlemend kir, wî ji xwe re got ku ew di kolanen Parîse de ne wîqasî beçare û be şans bû. Wî bajarî ere xwîna wî dimişt, hemû karen pîs û zehmet didan ber wî, deriyen jiyaneke hesan di rûye wî de digirtin le bele we roje, wî nedixwest ku ew destvala mîna parsekekî vegehiya male, mîna leşkere arteşek şikestî bizîviriya welate birîne. Wî serbajarî ji wî re xwe nişan da mîna mirovekîxwedî nan û xwe. Di we îstegeha vala de, wî pere hema bi ser wî de barandin, mala wî ji nû ve ava kir, jiyaneke nû li ber nîgen wî mîha berrek xweşik raxist.

Behzad nema li paketan geriya. Wî peren pir berdan berîken xwe, xistin paxîlen xwe. Wî çenteye xwe vala kir, tiştên te de dendstin û bi çengan deh firingen zer û penc firingen spî

berdan hundire wî. Dema çente tije bû, mekîne jî ji ber xwe ve rawestiya. Behzad rahişt çente, dîsa bi tirs û dora xwe nerî û zû ji we dere dûr ket. Ew bi kef bû le nedivverîbû kef û bextevveriya xwe diyar bikira. Ew tirsîya ku pergî rewiyekî zimandirej, an karkerekî îstegehe bibûya û ew pere ji wî bihatana standin û bi ser de jî, ew bihata girtin, dawî emir di girtîxanan de biriziya.

Hundire îstegehe bepîvan mezin bû û Behzad reya xwe şaşo maşo kir. Dalanan xwe li hev dipeçandin, ji hev derdiketin, ji hev dizan û serî li mirovan geji dikirin. Behzad nexwestibû di destpeke de bare xwe giran bikira le li ser selen çarqorzî en îstegehe, ere tene çenteyek bi wî re bû, le ew çente anuha pir sengîn bû û Behzad bi zehmetî di bin giraniya wî de diliviya. Wî gelek caran çente danî, bi destmala xwe xwedana

xwe zuha kir, behna xwe berda.

Ew di nava îstegeha herdem bedeng de digeriya, le wî reya xwe peyda nedikir. Di hundire îstegehe de wî wexte xwe bi gelek tiştan belav kir. Di nav dalanen pir de, li ser reya vegere, wî xwe gelekî winda kir. Wilo jî dema ew dawî bi ser eywana fireh ve bû û buhurî ciyen tirenan, şev ketibû. Şev ketibû û mije ji ser rûye îstegehe bar kiribû û cî ji perdeya tariye re vala kiribû.

Li derveyî eywane bayekî sar ü rûye wî xist wek ku wî bayî xwest ew ji bend û pençen xewnek ne xweş hişyar bikira. Tiren xuya bû ji mej ve ji ser sînga îstegehe rabûbûn, xwe gihandibûn deren dûr û hena beguman dûrtir diçûn. Piştî çûyîna tirenan reyen hesinî di bin lempeyen îstegehe de mîna sûren tazî di îlaşe şeve de radibûn û xwînek reş, tîr, bi ser bajare bîdeng de dirijandin. Tirena ku be wî bere xwe dabû şar û gun-

15

den welet anuha ji wî dûr bû, pir dûr bû.

Tene di nava şeva îstegehe de Behzad li keleka reyen hesinî geriya, nizanîbû çî bikira çî nekira. Mal hat bîra wî û wilo jî di we nave de bave wî li ber çaven wî di nava germa havînek pir bi tîn de xuya bû. Tiştan li ber çaven Behzad mîna fûîmekî sînemaye an mîna lîstikek şanoya dan dû hev. Bave wî peya ji gund dabû ser re û gihaştibû îstegeha bajare Oamişloye, hatibû peşiya wî. Li ser sînga îstegeha biçûk, ew tevî kalbûna xwe diçû û dihat, çaven xwe ji ber ronahiya roka xurt hema diqurmiçandin. Germe û toza spî xwe li bajar û li îstegeha biçûk wek ewrekî mezin peçandibûn. Karkere îstegehe, bawêşînek di dest de ji oda xwe derdiket û bi lez bere xwe dida mirove

kal. Wî destê xwe datanî ser mile kalo û bi dengê bilind di guhen giran de digot:

- Apo tu bi derewan U vir î. Tu tirenen din îro nema ten.

Vegere male, rok mejiye mirovan dileqîne.

Bave Behzad li rûye karmende îstegehe dineri û dipirsî:

- Te got îro tu tirenen din nema ten ?

- Apo nûn sed carî ji te re gotiye ku di roje de tene tirenek te û tirenek dire!

Bave kal sere xwe dihejand, bi dengê nizim di ber xwe de digot:

- Behzade min heye tune ye dîsa ji tirena xwe maye. Kar û baren Behzade min pir in.

Paşê bi dengê hinekî bilintir wî berdomand:

- Le ew e vegere. Te bi çaven sere xwe bibînî, ew e di tirenek din de be.

Ye karmend dile mirove kal tu carî nedihîşt û digot:

- Rast e Apo, rast e! Helbet ew e vegere. Ma eweli wan 16

derên dîr çî bike? Ma morîken diya wî li wan deran qetiyane j ta ew li wan vvelatan bimîne?

Bavo di nav qermîçoken salan de dikeniya. Kene wî herdem bi ve gotina karker dihat. Paşê çaven wî ji kefa dibiriqîn.

Wî bi destê karmende îsteteghe digirt û diguvaşt:

- Bi Xwede lawe min tu rast dibejî. Ma ew e li wan vvelatan çî bike?

Paşê wî xwe di nava bîranîn û fikran de xwe ji bîr dikir û wek ku bi tenha xwe buya digot:

- Behzade min we di tirena sibehe de be. Ez e bem peşiya

wî.

Behzad da dû bave xwe, xwest xwe baveta deste wî û bigota "Bibuhure, bavo, bibuhure!" le ji ber giranbûna çente zû bi zû xwe nezîk nekir û bavo ji ber çaven wî ket û di nav germa spî de winda bû.

Li ser rûye îstegeha vala Behzad çû û hat, destike çente xwe di nav tiliyen xwe de guvaşt. Wî ji xwe re got ku dikarîbû tev wan peran vegeriya oda xwe, li heviya tirena roja din bimaya. Bileta wî şevvitî bû le wî bi wan peren pir dikarî hezar biletên din bikirîya, ew yek ji binî ve ji wî re ne derdekî mezin bû. Wî kare xwe û vegere kir dema ji nişke ve tirenek li ber çavSn wî xuya bû. Ew bi gavine şist ber bi we ve çû û tirena dûrî sînga îstegehe ji nav tariya şeve derket. Ew pir kevn bû, le dîsa jî tîren bû û dikarîbû biçûya her devere, belkî jî ta bajare Qamişloke diçû. Piştî Qamişloye, re hesan dibû û eğer bi peyatî buya, an bi trumbeleke buya, wî e xwe bigihanda male. Behzad U keleka tirene rawestiya û li dora xwe nerî. Mirovek ji aliye sere we dihat û Behzad deste xwe rada paxîla xwe, li paseport û bileta xwe geriya. Bi we yeke terpînî ji nava wî

17  
hat û nas kir ku wî ew paseport û ew bilet tev çend tiştên din li keleka mekîna paketan ji bîr kiribû. Wî xwest xwe bida alî, xwe veşarta, le nedibû, mirov çav U wî ketibû. Sedema tîrsa wî bixwe ew çente mişt pere bû û giring bû wî gumanen napak ji xwe dûr bbristana. Ji ber ve yeke jî, wî bere xwe da wî mirovî, çû pergî wî. Wî nizanîbû gelo ew rewiyeke wek wî bû an karkerek ji karkerên îstegehe bû, le belkî jî şufere tirene bixwe bû.

Helbet wî xwest ku ew mirov kî buya bila bibûya le ne polîsek

an berpirsiyarek wan mekînen paketan buya. Wî e çend pirs U ser tevgera we tirene je bikira û ere an na, ew e bi reya xwe ve biçûya. Mirov berî deh duwanzdeh gavan ravvestiya û bi dengekî bilind pirsî:

- Ha xorto, xuya ye tu jî ji tirena xwe mayî?

Behzad hîs kir ku wî mirovî bi we pirse hinekî qerf û tinazen xwe bi wî dikirin û wilo jî ew di ciye xwe de sar ma. Pirs bi wî ne xweş hat, le wî divat bersiva we bida:

-Ere bi Xwede ez ji tirena xwe mam. Min û hevalekî me kare xwe ji bo vegere kiribû, le mixabin, min xwe di îstegehe de şaş kir.

- Rast e, ye din vegerand, di dalanen ve îstegehe de gelek xwe şaş dikin û ji tirenen xwe diminin.

Van gotinan hiştin ku Behzad bavver bikira ku wî mirovî xweş ew der nas dikir. Wilo jî wî deste xwe ber bi tirene ve kir û pirsî:

- Ma ez dikarim li ve tirene siwar bim û biçim ta bajare Qamişloke?

Wî mirovî deste xwe ber bi tirene ve kir:

-Tu li ser ve tirena han dipeyivî?

Di îstegehe de bixwe ji bilî we tirene tu tirenen din nebûn.

18

Tu ronahî ji hundire we nedihat der û hemû derî û pencereyen we girtî bûn. Sere we jî nedixuya, di nava şeve û dürbûne de winda dibû. Behzad bawer kir ku wî mirovî ew ji bîr kiribû û pirsaxwe bi awayekî din dubare kir:

- Ma gelo ev tiren ber bi Rojhilata Navîn ve nare?

Wî ji xwe re got ku eğer tiren rast neçûya Qamişloke, wî



dikarîbû bi kemanî bi saya we hinekî xwe nezîk bikira. Mirove ü îstegehe avviren xwe ji tirena reş birrîn, bi direjayî ü Behzad nerî û di bedengiya devere de pirseke din kir:

- Tu ji min re nabejî, xorto, çî di çente te de ye û cima berîken te wilo dagirtî ne?

Tişt bi ve pirse tev U hev bûn û Behzad xwe yek carî winda kir. Ew mirove hane ne ji bo xera wî di peşîya wî re derketibû û bi we pirse ew bû mîna xewneke pîs, mîna kabûsekî û xwe li ser sînga wî direj kir. Behzad xwest xwe ji ber we pirse û ji ber wî mirovî bida alî, dûr biketa. Wî xwest erd biqelişîya û we ew daqurtanda, ÎS wî betir xwest ber bi jor ve biçûya, bi-bûya başoke, helo, şahî, baz û bikira qîjîn û ber bi perre asmanan biçûya. Wî xwe mîna frrendeyekî dît û di şuna desten wî de du bask je re şîn hatin. Wî basken xwe di nav baye giran de li hev xistin, xwest ber bi asmanekî şîn, asmanekî sayî, asmanekî be tirs bifiriya. Wî desten xwe bi hiner û behntengî li hev xistin, le gewde giran ji ser ferşen îstegehe ranebû. Çente mişt pere her baske raste pûç kiribû û baske çepe be çare bilind dibû û dadiket. Basken Behzad di we revvşa dijvvar de bi kerî tu tiştî nehatin. Nigen wî jî li ser keviren îstegehe pûç bûn, heviya tu tiştî ji wan nehat kirin. Behzad dizanîbû çawa xwe di bajare fireh û tevlihev de veşarta, le tirşe xwe li cane wî mîna perdeyeke ji qeşe peçandibû, resasa hilandî berdabû

19  
ranen wî, we reya reve birrî bû. Wilo jî wî nema di ber xwe de da, di ciye xwe de U bendî biryara celade xwe ma.

Le ew mirov ne celad bû û kuştina tu kesî nedixwest. Wî tene bi bûyîna xwe U we dere dihişt ku Behzad di çaven xwe

de biçûk biba. Wî helbet dizanîbû ku rewiye ji tirena xwe mabû ketibû nav lepen wî, ji ber wî nikarîbû bireviya, le dema Behzad deng nekir, bersiv neda, wî ew deh duvvanzdeh gaven di we nevbere de rakirin, deste xwe direjî çente kir.

Behzad sere xwe xistibû ber xwe û ü solen xwe dinerî. Wî nizanîbû ye din bi rastî çî ji Xwedaye wî dixwest, cima îşe xwe ji kar û baren wî dianî. Wî di nava xwe de got ku ne ji bo xera wî bû we roje we mekîne ew peren hane ü ber wî raxistin, xewna jiyaneke din li ber çaven wî xweş kirin. Qedere ji mej ve heneke xwe bi wî fikir, ji revvşeke pîs ew dixist yek pîstir. Li ser selen reş û spî en mîna texte şetrence, qedere bi wî dilîst, xwe kiribû dijmine wî, fîl û kehehen wî, siwar û peyayen wî li dû hev dixwarin û mala wî weran fikir. We ji qazî ve kefa wî bi wan peran anî ta paşe betir ew pîs bikira.

Ronahiya li ser sere Behzad çels bû û wî mirovî rahişt çente, çend gavan dûr ket û di bin lempeyeke de ravvestiya. Wî çöken xwe dan erde, çente danî ber xwe, vekir û bi direjayî ü hundire wî temaşa kir. Wî av/iren xwe du se caran di navbera çente û rûye zerbûyî ye Behzad de birin û anîn. Wî nema zanîbû ne dile xwe bi Behzad ve bişevvitanda, ne bi wî bikeniya.

Dema Behzad dît ku deng ji wî mirovî dervediket, wî bi tirs sere xwe bilind kir û mîna girtiye li ber dadgeheke ji dînan hatibûya danîn, wî xwest zû biryar di derheqa wî de bihata birrîn ta ji we rewşa pir dijwar xelas biba. Mirov di ber xwe de sere xwe hejand. Paşe rabû ser xwe, rahişt çente, danî ser

20

mile xwe, deve wî ber bi jer ve kir. Terpînî ji nava Behzad hat û kir bikira qîrîn, ber bi wî mirovî biçûya, deste xwe baveta

çente, le ew ji ciye xwe neüviya. Ji nava çente qûmek hûr rijiya, mîna ave hat xware, U ber nigen wî kom bû. Wî mirovî çaven xwe ji rûye Behzad dernexist û got:

- Kî bîra qûme dibe? Te ev çente tije qûm kiribû, bare xwe bi derevva giran kiribû.

Behzad bawer nekir le tişte ji çente wî dirijiya ne baranek ji deh firingen zer û penc firingen spî bû. Ew xîzek nerm bû û we xîze li ber baye ku li îstegehe dilîst mîna marekî xwe xwar dikir û li ser keviren çarnîçik belav dibû. Behzad li heviye bû ku peren hesinî û ser keviren îstegehe bikirana çerqeçerq, le denge ku gihast guhen wî wek denge baye havîne di nav genimen zerbûyî de bû. Ta dile wî biketa cî û ji çaven xwe bawer bikira, wî deste xwe bi dizî rada berîka çakete xwe. Tiliyen w di nava xîzek henik de çikiyan. We gave wî betirs berîken xwe vala kirin û qûma hûr ji wan jî rijiya. Bi derketina qûme ji çente û ji berîkan tirşe xwe ji nava wî kişand. Wî ü tirene careke din nerî û di sere xwe de xatir je xwest. Wî çend gav ber bi dalanen îstegehe kolanen bajer avetin, dema denge wî mi-rovî dîsa ew gireda:

- Mal avayo, ma te li vî welatî ji bilî qûme tişteki din nedît? Paşe, hat bîra wî ku wî bersiva pirsên Behzad nedabû. Wî deste xwe direjî paxîla xwe kir, defterek mezin dendst û ewjî da ber ronahiya zer ya lempa çels. Wek ku ew li navekî, li nave Behzad bixwe bigeriya, wî bi behnek fireh tiliya xwe di ser çend rûpelan re bir. Wî sere xwe paşe bi neyî hejand:

- Na, xorto, îro tu nikarî ü ve tirene siwar bibî.

Paşe wî xwest xweş dile xwe bbdsta cî û careke din nerinen

xwe di ser rûpelen deftere re birin, ew pelen han yek bi yek qulipandin. Wî be ku sere xwe ji rûpelan dendsta got:

- Na Behzad, îro tu nikarî U tirene siwar bibî. Le rojeke ji rojan, mîna her kesî, tu e beyî paseport û beyî bilet le siwar bibî. Ev jî heqe her kesî ye.

Di avahiyen bajare Parîse de lempe peketibûn, di nava perda şeve de diçirisandin. Nehat bîra Behzad ji wî mirovî bipirsiya çawa wî nave wî dizanîbû û wî xwest hema zû ji we de- re dûr biketa. Wî rahişt çente xwe ye vala û ew du se gavan ji tirene dûr ket dema denge ye din xweş gihast guhen wî:

- Biner Behzad ne ez naxwazim ku tu li ve tirene îro siwar bî. Ciyen vala hena pir in, le ev yek ne di destê min de ye. Ev tîren bixwe tîrena mirine ye û li gor naven di deftera mezin de roja mirina te hena nehatiye.

Behzad pir westiya bû le wan gotinan reya reve, bazdane, ve çare U ber wî vekirin. Wî bere xwe bi lez da dergeha mezin dema denge ye din bedengiya îstegehe dirrand, da dû wî.

- Rojeke ji rojan, mîna her kesî tu e jî li ve tirene siwar bibî.

Behzad xwe dîsa li ser kevîren reş û spî en eyvvana fireh, eywana koşiken girtî û sûretan dîvvarî, dît. Wî sere xwe xist ber xwe û bere xwe da kolanen Parîse. Denge zingilekî gihast guhe wî. Wîji xwe re got ku tîrena reş dest pe kiribû ji ser zî- ke îstegehe radibû, li ser reya hesinî xwe bi vî alî, bi wî alî di- kir, bere xwe dida dînya nebedîbûyîne, tuxûben nevegere.

Denge zingil direj kir û li ser vî denge ne xweş Behzad ji nav texte razane rabû ser xwe. Wî destê xwe direjî saeta ber sere xwe kir, denge zingile ji bo ji xew hişyarkirine birrî. Wî

careke din xwe di nav ciyan de direj kir. Saet şeşe deste sibe-  
22

he bû û ew e biçûya ser kare xwe. Ew di oda xwe de di hav  
xwedanek demûşî de bû û behna wî xweş dervediket. Wî li  
garajeke li dervî Parîse bixwe herdem bi şevan kar dikir, le  
we hefteye, wî e bi roj kar bikira. Sere wî wek meşkeke pufdayî  
bû û dihat ji eşan belav biba. Ew ber bi pencere ve çû û  
tevî ku li derve sar bû wî ew vekir û li asmane reşî tarî nerî.  
Baye sar mîna pisîkeke U pist pencere bû, qeramûşken xwe li  
came didan, dixwest ji ber hovîtiya derve bibuhiriya hundir.  
Wî bayî bi vekirina pencere îşe Behzad hejand, berda xewe,  
da dû terîşen xewna ne xweş.

Ode li Parîsa şanzdehan nezîkî metroya Rue de la Pompe  
bû. Ji pencereya we banen bajare fireh û tevlihev bi lûleyen  
argûn û dûkeşan, bi antenen televîziyone di rojen sayî de  
dbcuyan. Şeve hena mîna lavvirekî di renge ariye de xwe li ser  
sînga bajar direj kiribû. We roje, çaven Behzad di pencere re  
tene pergî tariye û asmane girtî hatin.

Li derve, li çayxana li sere kuçe Behzad li ser daren nigan  
qehwa xwe vexwar û bere xwe bi lez da îstegeha metroye. Du  
saet re li ber wî hebûn ta xwe bigihanda kare xwe. Di hundire  
îstegehe de pir kes nebûn. Li ser dîvraran sûreten mezin pes-  
ne jiyaneke hesan, jiyaneke xweş didan. Di deste we sibeha zû  
de, di we sermaye de, keç û xortên lihevhatî û bejinzirav dikeniyên,  
siya jiyaneke tije kef û xweşî didan ber rûye karkerên li  
heviya tirene.

Metroya şîn hat. We rahişt Behzad û xwe berda nava tunelan,  
di bine erde de mîna marekî stûr xwe li hev peçand. Di

zike bajer de, çerxen hesinê kirin guregur. Behzad li denge bilind, li çerqeçerqa hesinan guhdarî dikir, le denge mirove ku li îstegehe pergî wî hatibû ji ber guhen wî nediçû. Wî den-

23

gî hema digot: " Rojêke ji rojan, tu e jî mîna her kesî li ve tire-  
ne siwar bibr.

24

### BAŞOKE

Saet nezîkî duduye piştî nîvro bû û germe te geş kiribû, te ji hal xistibû. Di oda te de tene pencereyek hebû. Te ew vekiribû le surra baye henik di we roje de ji bo dermanan jî peyda nedibû. Car caran hinek baye nîv germ nîv sar dixwest bibuhirya hundir, le wî reya xwe di ciye pir teng de nedidît, û li ber deve pencereye radivestiya. Piraniya miroven bajer di we roje de beguman di bin sevvanen rengareng de li keleka de-  
ryaya xwe ramidandibûn. Hin ji wan bi balafiran an jî bi gemiyen mezin dûrtir çûbûn, xwe gihandibûn peraven giraven fransî en U başûr. Her kesî ji ber wexme, ji ber bîna benzîna trumbel û navgînan xwe dabû alî.

Li Parîse, Siyamend, di oda xwe de, tu girtiye bajare tevlihev û zindaniye xwe û jiyane bûyî. Te karekî pîsik peyda kiri-

25

bû û hemû roj û seven te wek hev derbas dibûn. Te bi şeve kar dikir bi roje radizayî û ve yeke re nedida te ku tu bibûyayî wek însanan, wek her kesî bijiyayî. Wilo jî dema tu ji male derdiketî û diçûyî ser kare xwe, her kes ji kar vedigeriya. Di deste sibehe de te bere xwe dida oda xwe û di metroya de, di otobûsen bajer de te didît ku hîna şuna xewe li ser rû û de-

men şûştî, kurkirî, derman kirî xuya bû.

Gelek caran, dema te kar nedikir, tu derengê şeve ji male derdiketî. Xew di şevan de bi çaven te nedibû. Tu le kerr û geş dibûyî, li keleka ava ceme Seine le digeryayî. Reng û ronahiyen bajer mîna lavviren tî bere xwe didan çem, xwe di nav ava ku diherikî de dikirin, dilerziyan. Li keleka ave te xwe winda dikir, dûr diçûyî û carinan jî tu dibûyî başoke.

Ere, tu dibûyî başoke, helo, şahî, û tu bi basken xwe dûrî jiyana Parîse, dûrî serdemen tenhayîye, dûrî derd û kulen sirgûne diçûyî. Piştî ku tu digihaştî ber pere asmane bilind, te xwe berdida jer, tu mîna birûske diketî. Axa welet, ceme bajare te bi lez dihatin peşîya te, xwe dikirin xelatek û xwe bi giştî didane te. Te xwe pir nezîkî ava ceme bajer dikir û mîna rûye destekî te sere perîken xwe di ser rûye çem re bi evînî dibir, te ew mist dida, tevzînoken şahîye berdida hinava wî. Ceme bajare te li hemberî ceme Seine şiravek, cihokek av bû, le te pir je hez dikir, şev û rojan te beriya wî dikir. Av ji dile çiyayen bilind derdiket û tevî sînoran, tevî pîrbûna birînan, ew di nava gund û bajaran re bi giranî ber bi deryayen dûr diçû. Ere, li Parîse, li keleka Seine, tu dibûyî başoke, te bi bask û perîken xwe baye dûrbûne, demen eşe diqelaşt. Ava Seine bi deste te digirt, pencereyen xewn û daxwazîyan li ber te vedikir, te dispart bajare te, demen berî kuştin û şevvatan, berî

26

Koça Mezin.

We roja havîne tu di oda xwe de bûyî. Pencere vekirî bû, dile te teng bû, ji kul û derdan mişt û dagirtî bû. Tu ü mal bûyî dema bû çireçira telefona ü ser masa ber te. Te nizanîbû

di we germa ku bi ser rûye bajare Parîse de dibariya gelo tu di xew de an şiyar bûyê û te zû bi zû ranehişt telefone:

- Siyamend? Tu yî?

Dengekê bi zimane zikmakî pirsî. Dengekê bi tirs le dengekê xweş, wek ava ji çavkaniye bipijiqe, henik. Bi wî dengê re bayekê hebirmeşê derbasê hundire oda te bû. Te vegerand:

- Ere bira ez im. Ma tu kî yî?"

Û dema hevale te ye biçûkaniye nave xwe hilda, dile te ji kefa hat ji sînga te derketa. Ew bû mîna firendeyekê ku bi salan girtiye qefese mabûya û ji nişke ve asmanekê şîn, asmanekê be aso li ber basken wî vebûya. Dema Cengê ji te re got ku ew li Parîse, li îstegeha Gare du Norde li heviya te bû, te ji kefa bawer nekir. Te germa havîne, kesen ku çûbûn ber leven derî û giravan ji bîr kir. Di we oda teng de wek dînan li te hat. Tu rabûyê ser xwe û bi dengekê bilind, te ji hevale xwe re got:

- Cengê, ji ciye xwe melive! Ez e wek gülle bem.

Û bi rastî, mîna gulla ji lûla tufenge derkeve, tu jê wilo ji male derketî, bi pelikan ve hatî xware. Te bere xwe da tirena bine erde, îstegeha La Murette, metroya herî nezîk. Te bavver kir ku tu pir û heviya tirene mayî û te xwe negirt. Te xwest bi-bî başoke, heloye bilindiye, firendeye asmanen besînor. Te xwest basken xwe li hev xistana, perda tenhayiye, demen poşmaniye bi navperûşken xwe bidirranda, tiştîşî bikira.

Li Parîse, jiyana te tu bejê nebejê jiyaneke tevlihev bû. Şev û rojen te en vwindabûne, per^aniye, sehitiye bûn. Te xwe mîna

27  
qurme dareke mirî didît, neynikek şikestî, qirşikekê, dumana çbcareke li ber bayekê dîn û har. Hena salek nebuherîbû di ser



gihaştina te re ku hemû xewnen te berbat bûbûn. Di wan sa-  
lan de pir tişt li dora te hatin guhertin. Ji yana te Siyamend bi  
rastîjî mîna goristaneke bû û baye mahveraniye hema le dikir  
guveguv. Qesren xewnan û koşiken heviyan xwe U ber rewşa  
kambax negirtin. Di nava te de, xweliye şuna avahiyan daxwaziyan  
girt û mirine perdeya xwe li ser sînga te raxist, kone şîniye  
vegirt.

Di nav deh salen dawîn de, te tu deng ji hevale xwe nebihîstibû.  
Te nizanîbû çî bi sere wî hatibû. Gelek caran te ji xwe  
dipirsî: " Ma ew sax e, mirî ye? Eger sax e, gelo ew jî mîna  
min winda ye? " Carinan jî te digot beguman ew li bajarekî, di  
kampeke ji kampen penaberan de bû. Metroya diçû Mairie  
de Montreuil hat û r6 û revvanî tede tunebû. Tu, siwara eşe,  
tu siwar bûyî û te bi hezaran ji wan pirsên ku sere te ji ber  
wan dihat belav bibûya, te ji xwe kirin. Kesen li dora te hedî  
hedî ji ber çaven te ketin.

Gelek caran te xwe di metroya de ji bîr dikir û li îstegehine  
dûr tu bi ser hişe xwe ve dihatî. Tu vediciniqî dema denge şufere  
tîrene di megrefone de bi hişkî bang dikir : "îstegeha dawî,  
îstegeha dawî. Her kes dive peya bibe ". Ji ber ve yeke we  
roje tu li ser daren nigan şîpya mayî. Te îstegehen berî Gare  
du Nord dihej martin. Hin bi hin, tu nezîkî hevale xwe di-  
bûyî, hin bi hin nezîkî jiyaneke din dibûyî.

Helbet ne bi dile te bû ku bi metroya, bi tenha sere xwe, tu  
diçûyî pergî Cengî. Te bi kemanî dixwest bi trumbeleke, bi jin  
û zaroken xwe re biçûyayî. Le leyse! Daxwazî tişteke bûn û  
dijvvariya jiyane tişteke din bû. Li Parîsa bi nav û deng, di nav

deh milyon kesî de, ne te guh li kesî dikir, ne kesî guh li te dikir. Tu revviyekî li ser reya poşmaniye bûyî, tu herdem sivvare eşe bûyî. We roja tu çûyî pergî hevale xwe, tu ne bi tenha xwe bûyî, di gurregurra metroye de, di tarîkiya tunelan de kama-  
na derd û eşan dabû peşiya te, dû te, ketibû xwîna te, dev ji te bernedida.

Dema hûn li vvelet bûn gelek caran tu û Cengî, hûn ji baja-  
re biçûk derdiketin, çem û çem dimeşyan, nezîkî ave rûdiniştin. Hûn kembîr bûn û haye we hinge ji dem û devvranen çerxa feleke tunebû. Hûn li jiyaneke hesan, be sereş digeriyan. Mîna hemû xortên nûgihastî bala we pir diçû ser keçan, ser bihuşta xweşyan. Jinine destspî, levhunguvînî, porhebirmeşî, ber bi we dihatin, bi zimanine evvropayî di guhen we de dikirin pistepist, tevzînoken sar û germ berdidan cane we. We ji xwe re xweş dikir û digot: " Eğer em xwe bigihînin Evvropaye, li we dere keçên pir xweşik e li ser me dîn bibin ". We bawer dikir ku keçên porzcr xwe ji bo xortên wek we porreş û xwîngerm xwe dikirin erd, xwe li ser wan didan kuştin. Le Siyamend, bavveriyan we pir dûrî rastiye bûn. Berî her tiştî, keçên li ser porreşan dîn dibûn li ser her deh tiliyan destan dihatin hejmartin. Paşe, ji binî ve we bîra xortên evvropayî nedibir, we nizanîbû ku ew hebûn, ku wan dikarîbûn vvek we û belkî ji we çetir, kefa jinan ji xwe re bianîna. Ew bi kemanî ne mecbur bûn dev ji vvelate xwe berdin, ji bo parastina cane xwe an ji bo jiyaneke çetir bidin ser reyen dûr. Wan serdemen tirs û birçîtiye li paş xwe ji mej ve hiştibûn û dikarîbûn çaven jinan dagirin, terbikin, daxwaziyan vvan en biçûk û me-  
zin piraniya caran bi gewde bikin.

Le pir gazin ji te û ji xorten vvek te nedihatin kirin, çûnki  
29

hûn hena zaro bûn û bi ser de jî kesekî rastiya tiştan nedida  
ber çaven we. Bi kurtî, te rastiya tiştan nas kir piştî ku tu ketî  
nav wan, piştî ku te serma şehren sergûne û demen tenhayîye  
nas kirin. Jiyana te, li Evropaye bi çend gotinen kurt û sade  
mîna kirasekî pînekirî bû hema tazîtiya te dida ber çavan.

Tu di hundire metroye de diramiyayî. Sere te ji bare salan  
giran bû. Te dizanîbû ku hevale te mîna te tene bû, vvek çelîkekî  
çûkan bû, ji helîna xwe ketibû. Wî xwe U te girtibû, begu-  
man hevî fikir hinekî derden xwe ji bîr bikirana, bi te re ji nû  
ve vejeriya rojen zaroktiye, demen berî Koça Mezin.

Li Parîse herdem hişe te dûr diçû, hema xwe di nava bîranînan  
de vediziland. Rojen xweş, bi rastî xweş, di jiyana te de  
pir hindik bûn, le dîsa tu vedigeriyayî, diçûyî nava bûyeren  
berî Koçe. Tu ber bi îstegeha Gare du Norde ve diçûyî û rojek  
bi çend rojan berî Koça Mezin hat bîra te.

We roje, te û Cengî vve bere xwe da çiyayen bilind, reya  
hesinî, tixûb. Gotinen vve vvek axe pir bûn, dile vve ji tiştên negotî  
mişt bûn, le vve roje, hûn bedeng man. Baran ketibû û  
behna axa terav û gihaye şil xurt bû, bevila vve dax dida, digihaşt  
mejiye vve. Ava çem jî bedeng bû. We bajare biçûk li paş  
xwe hişt û hûn pir nezîkî çiyayen bilind bûn. Hûn li ser xweşiyen  
jiyane neaxiftin, vve tene dixwest çawa cane xwe ji mirinek  
ku roj bi roj nezîk dibû biparezin. Tirsê evvren xerdele,  
gaza mirine di nava vve gişa de cî girtibû. Gerek bû vve xwe  
bidaya alî çûnki deriye jiyanê di vî navçeyî de di rûye vve de  
hatibû girtin. Du se milyonan, bi xemgîniyeke mezin, xwe ji

bo Koça Mezin amede dikirin. Nerînen vve di ser hesine tire-  
ne re vvek başokan firiyan û wan, ango nerînen vve û başokan,  
sînor û stiriyan telen hesinî û birînen di cane vvelet de ji bîr

30

kirin. Leşkeren bi tufengen amerikanî û soviyetî ji ber çaven  
vve ketin. Ere, vve roje jî tu bûyî başoke, şahî, helo û te basken  
xwe di bin asmane vve roja buhare de li hev xistin, tu di ser se-  
ren wan çiyayen berz re firiyaî. Te sînga xwe ber bi baye henik  
kir û ji nişke ve te xwe berda xware. Tu pir nezîkî sînor  
bûyî, tixûb hilkişiya û ber bi te ve hat. Serbazekî ji aliyekî ji  
aliyan bere lûla tufenga otomatik ber bi te ve kir. Neh deh  
gulleyan perdeya aramiye di gelek deran de dirrandin. We  
xwe bi ser zik de avet, başoke kir qîjîn, ji ber çavan ket, di na-  
va tirejen roje de vvinda bû. Hûn ketin nevvaleke û çem û çem  
hûn ji çiyayî û ji vware daxwaziyan dûr ketin. Piştî vve roje bi  
çend rojan, destvala, birçî û xwas vve bi du se milyonan re be-  
re xwe dan sînoren dunyaye, vve bi destine vvestiyayî hema li  
deriyen Evvropaye xistin û xistin.

Dema metro ravvestiya tu bi pelikan çûyî jore û behna te  
hinekî hat ber te. Metroya Parîse mîna maran, mîna şahdamaren  
xwîne di îaşê bajar de xwe li hev dipeçand, belav dibû.

Behna te herdem teng dibû dema tu dadiketî zike bajare tev-  
lihev. Her çare, te ji xwe re digot: " Ma ez e çawa rûye du-  
nyaye carek din bi çaven sere xwe bibînim? " Li ser rûye  
dunyaye, di nav taren pir de jiyana te ne çetir bû ji vve jiyana  
di hundire metroye de, le di tariya tunelan de tu herdem ditirsiyayî.  
Ev tişte hane helbet bi biserhatiyan te û bi sirgûne  
ve giredayî bû. Li vvelet, dema te xwe berdida hinava şikeftan,

te xwe li ser axa henik vediziland, an xwe dida hev. Di şevreşa şikeftan de tirşe xwe ji nava te dikişand. Te çöken xwe car caran dixistin zike xwe û dibûyî mîna cenîn, tu vedigeriyayî zikmake. Li vvelate dûr, di tenhaiye de, zike Parîse tirsas mirine berdida cane te. Metroya Parîse te ditirsand, û ber çaven te

31  
dibû labîrenta vvindabûyîne, ware dînbûyîne.

Li îstegeha Gare du Norde tiren bi reze ravvestiyabûn, laşen xwe en hesinî dabûn ber germa roje. Tirenin dihatin û tîrenin diçûn. Baye hundire îstegehe giran bû, bîna mirovan diçikand. Pexwas û bevvaran, meyxur û heşîşkeşan, teryaqfiroşan, hemûyan ciye xwe di we de çe kiribûn, bi şev û bi roj le bûn. Tu li hevale xwe geriyayî û dile te di sînga te de ledida, dihat ji kefe û ji xemgîniye belav biba. Te berdida hesiran, leva xwe gez fikir. Le dema tu çav û Cengî ketî, du hesiren mîna du noken stevvyayî ji çaven te pijiqîn, li ser rûye te gindirîn û hatine xware. Cengî çenteyekî biçûk xistibû nav nigen xwe û hema li havvîrdora xwe dineri, li te digeriya.

We roje, Cengî bû mîna xencereke û destine dijmin cw di laşe te de gerrandin, hiştin ku birîn fireh bibûya, ji laş jî mezintir bibûya. Li Svvede, destekî Cengî ketibû ber diranen mekîna kar û hatibû birrîn. Mekîneye deste jekirî peşî rada zike xwe ye hesinî, hûrhûrî kir û paşe ew avet nava gemare. Mekîna ku nan dida Cengî ew mecbur kiribû ji bo silave deste çepe direjî deste mirovan bikira. Te Cengî hembez kir, li ser sînga xwe guvaşt. Hesiran çaven te şevvitandin û hatine der. Li îstegeha fireh vve nema fedî kir û vve kir kûrekûr. We ji bîr kir ku miroven gihaştî tu carî li peşiya nas û nenasan nagirîn,

le hevîtine hûn kirin du zaroken deh-duvvanzdeh salî, bi desten vve girt, vve vegerand demen biçûkaniye.

Û hat bîra te dema tu û Cengî di nevalen çem de hûn li keleka ave li keviren pehn û sivik digeriyan. We bi behna firêh ew heldibijartin. Paşe, bi zanebûn, vve ew di ser rûye avagolan re davetin. Keviren ku ji desten vve derdiketin dibûn hehecîken dûvmeqesî û bi fire nikilen xwe li ave dbcistin û

32

bilind dibûn. Penc, heyşt, deh caran kevir bilind dibûn, berî ku giraniya wan ew ber bi jer ve bikişandana. Bi dîlana vvan keviran re, dile vve jî bi sere govende digirt û baye vvelet kene vve, bexteweriya vve U ser kendalen çem digerand. Ev yek hate ber çaven te ji ber ku Cengî bi hemû lîstikan pir dizanîbû û bi taybetî bi avetina keviran di ser rûye avagolan re. Li îstegeha Parîsî, Cengî çakete xwe avetibû ser mile xwe ye raste, nedixwest te li mile be dest bineriya. L6 te çaven xwe ji şuna birine dernexistin. Cengî di ber dile te de da û got ku ew bin bûbû bi deste çepe, bi deste mayî her tişt bikira. Ta te je bavver bikira, wî deste xwe avet ser mile te, te ber bi sînga xwe ve kişand, car din rûye te maç kir. Le bavveriya te bi gotinen vala nebatin û mîna zarokan te je pirsî:

- Ma te karibî hîna keviran di ser rûye avagolan re bavejî?

Cengî U bendî pirseke vvilo nebû û vvî bi xemgînî û te nerî, sere xwe hejand. Ew tegihişt ku tu vegeriyabûyî keleka çem, rojen zaroktiye. Paşe evv hinekî keniya û vvî car din mile te guvaşt:

- Malavayo Siyamend! Em nema zarok in. Ma di temene me de, mirov keviran di ser avagolan re davejin?

We roje, di vve îstegehe de, te dizanîbû ku hevale te birîndar  
bû û kula dile vvî dijvvar bû. Te dizanîbû ku hundire vvî  
mîna hundire te ji came bû û evv cam hatibû şikestin, hûrhûrî  
bûbû.

Hûn vve roje di îstegeha Gare du Norde li bajare Parîse  
pir nepeyvîn. Te rahişt çente Cengî û hûn daketin nava me-  
troye. Tiren hat û hûn ketin zike vve. Mîna bi hezaran kesen  
din hûn hatin daqurtandin.

Siyamend, tu betirî pencî metrî di bine erde de bûyî.

33

Çiyayen bilind hatin bîra te. Di asmanekî pir şin de, başokan,  
heloyan, şahiyar basken xwe li hev xistin û kirin qîjîn.

34

#### QESRA XEWNAN

Ferzende Meşkinî nikarîbû bigota çavva vvî xwe U we dere  
dît, bi taybetî li keleka qesre, U ser we qûma nerm ya ku di  
bin lingen vvî de diçû xware û derbasî hundire solen vvî dibû.  
Wî dizanîbû ku evv dûrî tbcûben nebedîbûne ketibû. Wî xwe  
gihandibû Evvropa Rojava, vvare jîne, paytexte evîne. Wî nizanîbû  
gelo ü Italyaye bû, li Fransaye, an jî li vvelatekî ji Evv-  
ropa Jorîn bû; le ev tişt be qîmet bû û vvî meşa xwe  
berdomand. Roka ku diçû ava xwe bi ser deryayek pir mezin  
de berdida. Dem, di bin vvî asmane nizim de beguman payîz  
bû û rokek be tîn di davviya we roje de xwe bi ser mile asoye  
pehn de xwar fikir, dixwest piştî wextek ne pir direj xwe di  
nav ava deryaye de vvinda bikira.

Ferzend ber bi qesra dilbir diçû û hema ji xwe re xweş di-

35

kir, digot ku hevale vvî Paul li vve dere bû, beguman li ber dergehê ji dergehên qesre li heviya vvî bû. Bi riya xwe ya zer û direj, bi berçavokên xwe en girover û bi bejna xwe ya direj î zirav, Paul mîna leylane, çend kelîkan li ber çaven vvî geh xuya bû, geh vvinda bû.

Di bin asmanê giran de çend firendeyên deryayî hatin li ser sere Ferzend kirin qîjeqîj û paşe dûr ketin. Li ser xîza hûr Ferzend ji bilî sopa solên xwe tu şopen din nedîtin. Guhikên şeytân di bin lingen vvî de vvek berfe dikirin kirtekirt û diçûn xware. Bi xemgîniyê diyar Ferzend li sopa xwe meze kir û vvek ku hezar kesî di guhen vvî de ji vvî re bigotana, vvî dizanî- bû ku pelen ji dûr ve dihatin di demê kurt de e evv ji ber çavan bbdstana, evv dera han rast û şayik bikirana.

Wî û Paul ji mej ve hevdu nas dikirin, evv li Kurdistane pergî hev hatibûn. Paul hatibû Cizîra Botan û dixwest ji bo xwendina xwe li xwendegehê pirtûkek binivîsanda, lekolînek li ser destana Meme Alan çebikira. Wek ku vvî biçûkaniya xwe li perçeyekî ji perçeyên Kurdistane derbas kiribûya, vvî vvilo biserhatiya Meme belengaz û Zîna diltenik xweş nas dikir. Bi saya Ferzend, vvî gelek stran û çîrok ji deve dengbej û çîrokbejan dane hev. Paul xwe vvek parezgere mileten bîndest dida nişan û di bavveriya vvî de hemû dîroka Kurdan di evîna Mem û Zîne de bi gevvde û eşkere bû. Zikreşîya Bekoye Ewan û kemhişîya mîre mezin mîna jehre bûn û di cane gele kurd de digeriyan. Ji ber finasen neyaren mîna Beko û nezanebûna berpirsiyaren mîna biraye mezin, qiriktalî, perişani, malvveranî dibûn para mer û jina kurd, dibûn nane rojane, jana gel.



Ferzend vvestiyabû ji ber ku evv ji dûr ve, ji gundekî ji gun-  
36

den Cizîra Botan hatibû, 16 bele kefa vvî li cî bû. Wî dile xwe bi biserhatiyek nû xweş dikir. Di demeke pir kin de evv e derbasî nava qesre, hundire avahiya xewnen şîrîn û dilrevîn bi-  
bûya. Piştî çend kelîkan vvî e xwe berdaya hinava xweşiyen beser û bebinî. Hemû daxwaziyen vvî e bi cî bibûna û hemû sereşen vvî e bibûna bûyereke kevn...

Li vvelet û nemaze di seven havînan de, di wan seven ku tev nedibûn, xewe ji devila ku bihata bar dikir, xwe di nava navçeye de vvinda dikir, vve reya xwe şaş dikir. Ferzend xwe li ser bane xenî di bin asmane mişt steriken stûr û biçûk de radimidand, sere xwe datanî ser herdu desten xwe, riya kanvane peyda dikir û xwe di nava hejmar steriken behejmar de vvinda dikir. Ji ber germe û kelmeşen baxçeyen pembû, mirovan li derve, di bin asmane sayî de di bin hîzare xewnen şîrîn de xwe direj dikirin. Ferzend li ser bane xenî dixwest nezîkî vware xeyalan buya. Sivvare tenhayîye U ser mehîna boz ya miradan sivvar dibû, dûrî navçeya xwîn û şevvatan diket. Mehîne bi hesanî hefsar ji deste vvî distand û mîna sterika ku birije, vve xwe bi ser mile asmane fireh de xwar dikir û dûr diçû. Ferzend û mehîne goristanen behejmar li dû xwe dihîştin, serdemen mahveraniyan ji bîr dikirin, bi hev re diçûn ware jîne, roj û seven evîne. Ferzend kaviil û demen xwîn xwaran û behna mirine li paş xwe dihişt. Di wan seven direj de, vvî qesr di sere xwe de xweştir dikir, rengareng dikir, vvek bûkeke dixemiland, bi deste vve digirt, dibir bal xwe û evv li keleka xwe, li ser ciyan direj dikir. Evv dibû Ferhade evîndar, ji Şîrîna xwe

re qesrek berz ji daxwaziyan saz dikir, evv dibû Mem û bi agire nava xwe seven hovîtiye dikirin rojen heviye û govenden rindiye. Paşe, vvî xwe berdida hundire we û xwe di dalan û ey-  
37

vvanen pir de bi kefxweşiya mest û aşiqan vvinda dikir.

Di dane vve evare de, Ferzend ne li ser bane xanî bû, evv dûrî Cizîre ketibû. Evv bi lez ber bi qesre ve diçû û roka qels jîxwe bi ser mile aso de xwar dikir. Ferzend bala xwe daye ku qesr nezîk nedibû, li paş perdeya mije, te digot, diliviya û mîna gemiyeke mezin ü ser deryaya xwe ji ber vvî dida alî. Tişt di davviya roje de ü ber çaven vvî, vvek di xewnen şevan de, geh diketin hundire hev, geh ji nav hev derdiketin.

Wî helbet dixwest betir bilezanda, le qûma hûr, mbcabin, di bin lingen vvî de diçû xware, re nedida vvî. Deve vvî li keleka ava boş, li keleka deryaye zuha bû. Wî zimane xwe di ser leven xwe re birin û evv ziman vvek ku ne zimane vvî buya je re xuya bû. Evv ziman di korta deve vvî de vvek textekî zivir û pûç bû. Tama qûme di zengeloka vvî de ase bû û tevî vvî xwe du se caran kuxand tam hema vvilo ma. Dûnya li keleka vve deryaye ne germ bû, le ji ber ku vvî dilezand xwedanek mezeloqî dest pe kir ji eniya vvî hat xware û tev töze bû.

Wî li roka ku diçû ava û li saeta bazine deste xwe nerî vvek ku soza vvî bi Paul re hebûya û evv dereng gihaştibûya vve dere. Mîlen saete, her se, li ser hev sivvar bûbûn û nedigeriyan. Ferzend di ber xwe de got ku beguman sûc sûce baye terxwe bû. Wî saeta xwe bi behntengiyek diyar bi hers hejand û paşe evv nezîkî guhe xwe kir. Wî xwest tiketika mü û cemken hûrik bibihîsta. Dema vvî vvilo guhdarî kir, çend deng gihaştin guhen

vvî. Ji vvî vvere peşî evv dera hane bedeng û aram bû, le dema vvî guhdarî kir, denge pelen ku ji dûr ve dihatin gihaşt vvî. Firendeyen spî en li keleka ave dijîn sînga xwe ber bi be û roka ku diçû ava ve dikirin, hema dikirin qajeqaj. Du se çaren din vvî saeta xwe hejand. Mîlen saete neliviyar û Ferzend 38

li paş xwe zîvirî, pişta xwe da qesre û ta ji vvî hat vvî dûr avet. Saete di asmane nizim de kevanek çekir û dûrî sî çel gavî di xîze de çû xware. Ferzend le poşman nebû û meşa xwe berdomand. Dema Ferzend gihaşt ber avahiye, vvî dît ku evv ne vveke ku Paul pesne vve dabû û ne vvek ku vvî di sere xwe de, di seven Cizîra Botan de bavver dikir, bû. Qesra bi nav û deng, qesra berz, birca belek, di davviya vve roja payize de, di renga qûme de bû. Tu kes jî li dora vve nebû. Dergevanan ji tiye xwe bar kiribûn û qesra bedew ji baye terxwe û terxîz re hiştibûn, wan evv sipartibûn reşken bexwedîbûne, demen nebedîbûne. Mîna qesren ku zaroken bajariyan di havînan de û ser keleken deryan ji xwe re ji xîza nerm çedikin û bi paniyen xwe ji hev dixin dema dile wan ji lîstikan sar dibe, qesra Ferzend, qesra dilbir anuha vvilo bû.

Dergeh hemû girtî bûn, beguman ji demek direj ve û pîre kone xwe û ser vvan çekiribû. Ferzend li ber dergeha di sînga avahiye de ravvestiya û meze kir. Di tevne pîre de çend meşan beçare dixwestin xwe azad bikirana, xwe ji dafen mirine derxistana. Ferzend baş li vvan meşan nerî û bbcvvesta nexwesta vvî xwe vvek vvan dît, xwe girtiye revvşek tevlihev dît. Di we navbere de, fikira vegere hat sere vvî. Le evv e vegeriya kudere, di nav kîjan mirine de vvî e reyek jîne li ber xwe bidîta? Wî

bi zore xwe gihandibû vve dere, bi zore xwe ji nav qîlen mirine xelas kiribû û evv e çavva bizîviriya? Li ber dergehe, vvî rojen çûyî anîn bêra xwe. Ji bilî mirin û kuştin û şevvate tiştêkî din nehat ber çaven vvî. Di nameyeke de vvî ji Paul re nivîsandibû: "Doste delal. Min gelek name ji te re şandin le tu dengji te demeket. Ez hevîdar im tepîiîka xweya li ser destana Menî û

39

Zîni tveşandiye. Dema em bi hev re li gîtd û bajarên digeriyan, rojeke te got ku li welate te Mem û Zîn bi hâşam bi hev şad dibin û kesen wek Beko dibin dergevanin qehpexanan, mirovan ji bo peron berdidin serjin û namusa xwe. Li Cizîre, hevale heja, ne tene Mem û Zîn perişan dibin, li her kes li ber lehiya mirini diçe. Agirji her alî bi ser rûye dînya me de dibare. Di destpeka roji de şevvat, di nav roje de şewat, di dane evari de şetvat, di nîvê şevan de şewat, şevvat, şewat.

Doste heja Paul, di hemû nameyan min de, tu dibînî ez herdem ji te dipirsim, divazim nas bikini cîma çerxa gerdûni, bayî feleki, ji destpeka dînyaya hema li dora sere me digere, cîma mirin dide peşîya me, paşîya me, tengala me, dev ji me bernade."

Paul bersiva nameyan nedida û bi ser de jî, vve roje, li vvelate xwe, evv ne li gorî soza xwe derket, ne li gorî soza mereçe. Wî Ferzend tene di nava gerrîneken tiştên ne diketin serîyan li ber dergeha qesre hişt, evv bi gaziya hevware nehat.

Di nameyeke de Ferzend nivîsandibû:

"Ivelatji me re nemaye. Eşkere ye em çidibin tenî ji bo goristnan mişt îaşê mirîyan bikin. Metnî Alan û Zîna xwînşerîn dibin bermaliyîn Beko, dibin izingji bo mrtkirina agirî çavnebarîyî.

Dosti delal, li Cizîra Botan, li wari işq û evîni, tene şetvat e, şetvat."

Ferzend nikarîbû li bendî hevale xwe bimaya, nikarîbû bizivirîya û deste xwe direj kir, tevne pîre xera kir. Derî bi hesaniyek mezin vebû. Ferzend hinekî li ber ravvestiya û li dora xwe nerî. Paul ne li vvan deran bû û vvî ji xwe re got: "Hebe nebe, evv e li heviya min di hundire qesre de be".

Hundire qesre pir sar bû. Ferzend bi çeken havînen vvelet  
40

hatibû û serma xurt mîna hîzarek ji qeşe xwe li cane vvî peçand, xwîn di damaren vvî de hişk kir. Wîji binî ve kare xwe û vve sermaye nekiribû û di vvan seven li ser bane xanî, di bin steriken behejmar de, vvî bavver dikir ku nava qesre herdem henik bû, mîna buhişte ne germ ne sar bû. Evv poşman bû ci- ma ji bo we reya dûr vvî baş kare xwe nekiribû, le vvî e çavva baş kare xwe bikira dema mirin ji her dere dipijiqî? Ga dema dikeve ker U ser stûye vvî pir dibin û mirov dema dikeve nav lehiya mirine evv deste xwe daveje her tiştî, ta qirşiken ser rûye ave. Xwişka vvî Şîrîne hînî çekirina vezelen hirî bûbû û we ji bo vvî vezelekî pir heja, germ ji bo zivistane çekiribû, le di tevliheviya bûyeran de, di firtoneye de vvî bi zore cane xwe ji mirine xelas kiribû. Wî e çavva bîra vvî vezeleyî bibira?

Her du se gavan vveneyek an berrek pir dilbir hebû û di nav hev re vvan jiyana gele vvî vvelatî mîna fîlmekî sînemaye li ber çaven vvî raxistin. Hemû dîroka vvî gelî di bin ronahiyeke qels de U ber çaven vvî vvek rûpelen pirtûkek rengîn pehn bû. Ronahî ji zike ban dihat û ji ber ku ji binî ve di qesre de rojîn û pencere nebûn, Ferzend bavver kir ku evv ronahiya hane ya

lempeyen elektrîkî bû. Wî sere xwe bilind kir û li zike xenî nerî. Siryaqe avahiye tije derz û qelş bûn û di vvan re tîşen roje dibuhirîn hundir û di nava dalan û eyvvanan de belav dibûn. Qelşen mîna maran di zike avahiye de xwe U hev dipeçandin û li hemû dîvvaran belav dibûn.

Ma Paul li kudere bû ta bihata gaziya vî, evv ji vve revvşa dijvvar derxista, deriye heviya rohnî di rûye vî de vekira? Di gelek nameyen xwe de, Ferzend fikir gazî. Careke vî nivîsandibû: "Dosti dostan, ezîzi ezîzan, wari Mem û Zîni herdem bipit

41

û bizot e. Her roj bi hezaran kesen mîna Mem, mîna Zîni dişewitin, berbat dibin. Tu dibînî dema ez dinivîsînim gotinen mîna "agir", mîna "şewat" herdem ciyekî mezin di nameyin min de digirin. Tu bixwe dizanî ku Cizîra Botan wari hişînkahiye ye. Di zivistanan de berf dikeve, reyen di navbera gund û bajaran de tene girtin. Li dosti hija, eğer mirin di seri her kesî de bi sennayi giridayîye, di sereme de, ewjîşewate, agir e."

Ferzend tirs û sermaya hundire qesre ji bîr kir û bi hinek kefxweşî û tabloyan, li berran, li pûten ji kevire mermer û ji bronze nerî. Weneyen li ser dîvvaran ere jiyane rengareng li ber çaven vî radbristin le evv ji vve jiyane dûr dima. Wene pir bilind bûn û di ronahiya roka ku diçû ava de, Ferzend xweş evv ji hev dernedbdstin. Wî tene ji rojen vvelet dizanîbû ku evv pir xweşik bûn. Evv ji eyvaneke buhurî eyvaneke û di nava vve jiyane de vî xwe hinekî kefxweş dît.

Berren bi ser rûyen dîvvaran dakirî berren vvelet anîn bîra vî. Wan rojen zaroktiye, xweşiya demen kurt anîn ber çaven vî. Ferzend zaro bû û carina jî xweha vî şîrîne bi deste vî digirt

û evv bixwe re dibir Navenda Tevn û Berran. We li vve de-  
re bi keçen di temene xwe de kar dikir. Di nav dîvvaren  
Navende de tiliyen keçen şahreze li ser rûye berran cîhaneke  
rengareng li ber çaven Ferzend vedikirin. Tiliyen nerm û zirav  
firende bi asmanan dbdstin, xwîn û hers di cane şer û pilingan  
de digerlandin. Wan tiliyan destanen kevn jî bi gevde  
dikirin û li ser rûye vvan berran, Mem û Zîn, Siyamend û Xece,  
Ferhad û Şîrîn digihaştin miraden xwe. Qehremanen mî-  
na Rusteme Zal û Kawaye hesinger dile Ferzende zar mişt  
hezkirin dikirin. Di davviya roje de, Şîrîne bi deste biraye xwe  
digirt û xweh û bira, peya vedigeriyan male. Dema şev diket,  
42

Ferzend di nav ciyen xwe de ji kirase pehlevvanekî diket yekî  
din, evv geh dibû Rusteme Zal, geh dibû Kavvaye hesinger, di-  
bû sivvare hespe bayî, hespe deryayî, evv dibû sivvare hespe  
daxwaziyen bedavvî. Di salen paşîn de, dema vvî hezkirin nas  
kir, evv carinan jî dibû Mem, Siyamend an jî Ferhad.

Di hundire qesre de gera vvî direj kir. Di navenda eyvvane-  
ke de evv çav li tabûtek ji kevre reş ket û di ciye xwe de 1erziya.  
We tabûte car din mirin da ber rûye vvî, evv mirina ku evv  
ji ber direviya, mirina ku ji ser sînga Cizîre ranedibû. We evv  
vegerand demen şevvatan û navçeya goristanen beser û bebinî.  
Bi dîtina vve tabûte Ferzend fikir kir ku dîvvar û dîvvar  
biçûya, bibuhuriya eyvvaneke din. Wek ku vvî tenhayî, serma û  
tarîtiya ku xwe U qesre peçandibûn di ser guhen xwe re avet,  
vvî dikarîbû evv tabut jî ji bîr bikira. Le di we navbere de vvî  
xwest nave xwediye tabûte nas bikira û vvilo jî nezîkî vve bû.  
Ferşe kevir ne li ciye xwe bû û di şûne de tu tiştî deve ta-

bûte nedigirt. Di nava kefene rizyayî de, kiloxe miriyekî û herdu korten çaven vvî xuya dikirin. Li ser qehfe serî tacek ji zere zer û ji mîrvvare û gevvheren giranbuha hebû. Li ser parsûyen sînge, şûrekî direj û pehn hebû. Ye mirî destike sûre xwe di bedengiya qesre de di nav hestiyen tiliyen xwe de diguvaşt. Bi dîtina vvan hestiyen savva mirine mîna marekî reş xwe berda hinava Ferzend, hişt ku evv nave ye mirî ji bîr bike, bi payine şist dûrî tabûte bikeve. Nezîkî deh panzdeh gavan, lingen vvî di tiştêkî de ase bûn û evv lukumî û bi ser dev de çû xware. Wî deste xwe di ser ser û laşe xwe re bir. Sermaye vvek derziyek bence di laşe vvî de çikiya bû û her deren vvî pûç kiribû. Ferzend dît ku tu dere vvî nedeşiya. Ji leven vvî avek tîr û 43

germ dihat. Wî nas kir ku evv xwîn bû, le dema deste xwe nezîkî rûye xwe kir, da ber ronahiya tîştîşî, vvî tiştêk nedît. Evv rabû ser xwe û desten xwe vvek koran pelikand. Wî nas kir ku tişte ketibû nav lingen vvî mexmel bû, stûr û germ bû. Wî ji xwe re got ku di vve revvşa dijvvar de, di serma be hedan de, evv tişte xwîn ji deve vvî anîbû dana asmanan bû. vvî nizanîbû vvî cavvî li vve dere çî dikir, le vvî bavver kir ku hinan evv vvinda kiribûn. Wî dikarîbû ji Paul bipirsiya dema pergî hev bihatana. Cavv hinekî giran bû le vvî serma hundire qesre şikenand. Tabloyen bi ser dîvvaran dakirî û berren xweşik dîsa bang Ferzend kirin, dîsa siya jiyaneke xweş li ber ruye vvî raxistin. Ferzend تنها xwe geriya û di eyvvanekê de çav li berrek pir dilbir ket. Di berre de keçek şazdeh hivdeh salî U ber çavkaniyêke ravvestiya bû, kûze ave avetibû ser mile xwe. Keça dilrevîn deve kûze xwe piştî ku dagirtibû ber bi jer ve kiribû û



avek mîna rûn je dirijiya. Ave bi ser cane vve di nava herdu memiken biçûk re mîna marekî xwe li hev badida û ber bi jer ve diçû xware. Ava henik ji bejna zirav hez dikir, di nav herdu heten girover de dadiket. Li ber nigen civvana lavvend, mare avî dibû mîna sehekî, xwe dida hev, sere xwe dixist nav düve xwe û di xewek serîn de diçû.

Gelo Ferzend çiqasî ü ber vve keçe ma? Evv beguman demeke direj ma û dikarîbû jiyana xwe giş hema li ber nigen vve periye derbas bikira. Wî ji xwe re got ku vvî bi hezaren caran evv rûye hane dîtibû, le temaşa kiribû, je hez jî kiribû. Evv rûye hane, camkirî, pervvazkirî, U ser dîvvaren piraniya malen Cizîre bû. Evv dem û leven lihevhatî, nazik, girover, bixwe dem û leven Zîne, dilbera Meme Alan bûn.

44

Rû be şik rûye Zîne bû. Le bele evv îaşe nîvtazî, di destana evîne de tişteki din bû, bûyerek nû bû. Zîne li vvî vvelate dûr, li keleka vve deryaye çilen kurdî, kirase perîşaniye ji xwe kiribû, bi avvayekî nû li heviya Meme xwe dima, bi rengekî din ji vvî hez dikir û di ber dile vvî de dida. Zîne di çarçefa vve weneye de nema guh li dek û dolaben Bekoye Evvan dikir û biraya vve jî dev ji mîrîtiya xwe berdida, dev ji payetîya xwe, keretîya xwe diqerîya, karekî din ji xwe re peyda dikir. Ji nişke ve qurpequrpa lingine bi lez li ser keviren qesre gihaştin guhe Ferzend û evv ji nava pelen xweşiye kişandin. Ferzend avviren xwe ji berra dilrevîn birrîn. Di nava ronahiyek pir qels de, Paul li ber çaven vvî mîna reşke şeve xuya bû, nezîk bû, le vvî çend gaven mezin di vve navbere de hiştin. Wî silav nekir, negot "tu bi xer hatî yî ". Wî deste xwe jî direjî de-

ste direjkirî nekir û bi dengekî bilind bi ser Ferzend de qîriya:

- Ma tu dîn bûyî Ferzend? Ev çi kefen e te li xwe peçaye?

Ferzend tenegihîşt û di ciye xwe de sar bû. Wî heviya çi di-  
kir û anuha Paul çavva dihate peşiya vvî, çavva bi vvî re dipeyvî.

Wî got:

- Kefene çi malava?

Paşe, vvî nas kir ku pirs pirs a cavv bû û vvî berdomand:

- Eger tu li ser vî cavvî dipeyvî, bi Xwede min sar bû û min  
evv li ser rûye erde dît. Min ji xwe re got heye tune ye evv ji mirovekî  
ketiye û...

Paul ji behntengiya hinava xwe re neda û car din qîriya:

- Mirove çi hale çi! Evv cavve te bi ser mile xwe dakiriye  
bixwe perçekî ji kefene xwediye qesre ye. Beje, ma ne te evv  
di eyvvana tabûte de dîtîye?

45

Ferzend xwe ji mej ye ji bo hevdîtineke geş amade dikir.

Evv ji dûr ve dihat û dixwest qiriktalî û perişani ji bîr bikirana.

Ere, vvî li der û dora we avahiye dixwest ji bîr bikira cima he-  
ma mirin bi ser rûye Cizîre dibariya. Wî divat bersiva gelek

tiştan bizanîbûya û gelek tişt jî ji bîr bikirana. Wî helbet diza-

nîbû ku Paul ne Xwede bû ta bi gotineke hemû jiyana vvî biguherta,

le evv hevîdar bû ku bi saya vvî vvî hinekî aşitî piştî

vvan salen şevvatan li vve dere peyda bikira.

Wî cavve ser mile xwe bi heyecan avet, li hevale xwe meze

kir û tevî ku dile vvî mişt bû, tu gotin ji deve vvî derneket.

Denge Paul gihaşt guhe vvî:

- Bibuhire, ez nikarim betir bi kar û bare te dakevim, bi te

re li ve dere bimînim. Tembîya min li te tu zû xwe bigihînî

dergeheke beri ku tu av û av herî.

Paul negot çavva Ferzend e di nava vve qesre de li keleka we deryaya av û av biçûya. Wî rahişt cavve ser rûye erde û evv li hev peçand. Wî xwest beguman evv dîsa bi ser tabûte dakira, an jî, hema evv ü eyvane vvek ku Ferzend evv dîtibû baveta. Wî xweş hundire qesre nas dikir û mîna reşke şeve evv ji ber çavan ket.

Ferzend di nava qesre de ma û vvî tembîyen Paul di davviya vve roje de di ser guhen xwe re avet. Evv ber bi tu dergehan neçû. Wî dizanîbû ku dûrketina vvî ji Cizîra Botan çevvtiyek bû û hatina vvî ya vve dere rengê ji rengen reve bû, şikestinek bû, le jiyana vvî bi giştîya xwe çi bû? Ma evv ne şikestin li dû şikestine, çevvtî ü dû çevvtiye, mirin li dû mirine bû? Wî dizanîbû ku di serma vve qesre de vvî e herdem Cizîr bi germa xwe, bi diyvvariya evîna xwe, bi zehmetiya jîna xwe bi bîra xwe bianiya, le vvî bere xwe neda tu dergehan. Dema sermaye dîsa

46

xwe li cane vvî gerand, vvî bere xwe da eyvvana fireh ya tabûte û betirs li vvî cavvî geriya.

Li derve, roka ku çûbû ava çend perçeyen sor li ser mile aso hiştibû. Guhiken şeyten û kevjalên mirî xîza li keleka qesre rast kiribûn. Di davviya vve roje de, tu şopen solan li qiraxa ave li ser vve qûma di bin nigan de diçû xware nedbmyan.

47

## ROJEK VVEK ROJEN DÎN

Eğer berî deh duvvanzdeh salan ji Daraya Dihokî bihataya pirsîn: "Gelo çi tişt hev di bin stûna asmen de je ne xweştir heye?", vvî e di cî de bigota: "Evv jiyana di kampen penaberan

de ye, evv ji niştiman û vvelet dûrketin e". Le ji vvan deh du-  
vvanzdeh salan û vir de, eğer hem evv pirsan han ji vvî bihataya  
kirin, vvî e beguman bersiva xwe bi avvayekî din bidaya.

We roje, bayekî xurt li Parîse dikir vîzevîz û mîna melkesek  
pehn ku ne dihat dîtin, vvî keleken caden herdem tije va-  
la kiribû. Dara di odeya qate heftan de nekir debar û derket.  
Evv li îstegeha Porte d'Auteuile ü metroye sivvar bû û bere  
xwe da Tara latîhî di navenda bajar de. Piştî ku vvî careke li  
Trocadéroye metro guherand, evv ü îstegeha Mabillone, li ta-  
ra Saint Germain des Pres peya bû. Di gel ku evv tar herdem  
48

bi tevgereke mezin bû Dara we roje pergî pir kem kesan hat.  
Wî di nav vvan reyen teng de direj nekir û bere xwe da çayxana  
xwe. Roj ji binî ve ne roja derketine bû; evv rojek bû ku  
mirov ü malan xwe, bi jin û zaroken xwe re rûdiniştin. Le Da-  
ra ne xwedî jin û zarok bû û ne dostika vvî hebû. Wî e li male  
bi tenha sere xwe çi bikira?

Hundire çayxane vveke cadeyen bajar vala bû. Garsonan  
anişken xwe danîbûn ser keleka bara ji mise û ji xwe re henek  
dikirin. Dara di vve çayxane de ji çend ciyan hez dikir û vvilo jî  
vvî bere xwe da qate jorîn. Berî ku bi pelikan ve hilkişiya, vvî  
vvek her çare li Lîza nerî. Lîza keça fransî, keça dilrevîn her-  
dem dev bi ken bû û diranen vve en spî di nav leven vve en sor  
û dagirtî de mîna mîrvvaran diçirisandin. Ji ber ku vve roje  
çayxane bej hema vikîvala bû, Dara dikarîbû betir ji xwe re li  
vve binerîya. Wî nizanîbû bi rastî nave vve çi bû le vvî ji nave  
Lîza hez dikir û vvî evv nav le kiribû. Evv ji xweşikbûna rû û la-  
şe we tu carî ter nedibû, dikarîbû bi salan li ber vvan bima. Lî-

za jî dizanîbû çavva xwe nazenîn bikira û xwe li ber dile xortan şîrîn bikira. We hema ji ciye xwe dev ji kene xwe bernedida, xwe li ber dile kirîdaran xwe naz dikir. We ne digot ne ere ne na û hema şûşa Coka Cola nezîkî deve xwe dikir, ji kaniya xweşiye vedixwar û dikiya. Li ser surete dîvvarî, Lîza herdem bi derpiyekî pir biçûk bû û sînga xwe ya dagirtî dida ber roka havînek germ. We xwe li ser qûmek nerm ramidandibû, û haye vve ji baye feleke tunebû. We tene dixwest vexuren Coka Cola pirtir bikirana, dîcvvest ku mirovan tene ji ava leven vve û ji şûşa di destê vve de vexwarana û tucarî tîhna vvan neşikesta.

Dara nikarîbû pir li vvir bima, kene garsonen çayxane bix-  
49

vve bianiya. Li qate jorîn tu kes nebû û vî ciyekî nezîkî pencera mezin helbijart. Ji vî ciyê vî herdû caden bajar en mezin didîtin, rezen dukanan, daren bexçeye Cluny û otobusen kesk en bajar. Wek her car, vî pirtûk û nivîsen xwe danîn ber xwe, pirtûkek ku ji mej ve dixwest bfacvenda vekir. Wî hinekî zor li xwe kir ji ber ku ji binê ve dile vî nediçû ne xwendine ne nivîsandine. Sere vî ji derd û kulan giran bû û tîp û rezan li ber çaven vî dîlan kirin, bûn vvek mûrçeyen hûr, vvek gergerîken reş û li ser rûpelan gerîyan. Dara pirtûk girt û bi xemgînî nêrînen xwe li ser şaxen daren rût gerandin. Baye xurt şaxen be pel bi hers li hev dixistin û tevî ku pencerên çayxane girtî bûn, nalenala daran û carecara bayî gihastin guhen vî. Evvrine avis di bin zike asmane nizim de dabûn dû hev.

Dara deftera xwe ya navnîşan û hejmaren telefona vekir, pelen vve li hev xistin. Du se kes hebûn vî dikarîbû ji vvan re

telefon bikira. Le vvî deftera xwe car din xist çente xwe. Wî nexwest tu kesî di serma we roje de eciz bikira. Paşe vvî di di- le xwe de dizanîbû ku vvan du se kesan e ji xwe re li behaneyan bigeriyana: "Bubuhure, Dara can, piştî du rojan îmtihanen min hene", "Bi sere te Dara hevala min ji Lyone ji bo min hatiye, anuha li bal min e û nabe ez vve bi tene bihelim", "Sibe ez kar dikim û gerek ez hinekî xwe amede bikim, tu dizanî kar çavva wexte mirovan dibe", "Bi sere te Dara taye min girtî ye û di nav ciyan de xwedanek min digire yek min berdide". Wan hemvvelatiyan dikarîbûn bi hezaran tiştên vviha bigotana û digotin jî. Baye xurt di bexçeye li hember çayxane bi çiqilen beçare ji xwe re dilîst û bi bezariya vvan dikeniya.

Gersonek bi payine sivik bi pelikan hilkişiya û ji pelika davvîn ji dûranî got: "Wek her car qehwak û qedehek av ne vvi-  
50

lo?" Dara got: "Ere, ji kerema te" û dîsa sere xwe xist cama pencere. Otobusa 96 an ku diçû Porte de Lilas derbas bû û ji bilîşufer û du revviyan tu kesen din te de tunebûn.

Dara qehwa xwe kir du se qurt beyî ku bizanîbûya evv giran an sivik bû, bi şekir an be şekir bû. Wî her car qehwe dixwest ji ber ku erzan bû, paşe vvî ji qehwe hez dikir ne ku hez nedikir. Demek direj di we navbere de nebuhurîbû dema vvî bavver kir ku dengên payine sivik ji jer ve hatin. Li ber guhen vvî gav biçûk bûn û vvî ji xwe re got ku hebûya nebûya jineke bere xwe dabû aramiya qate jorîn. Wilo jî nerînen vvî bi pelikan ve giredayî man ta ku keçek ji vvî re di valahiya devere de xuya bû. Keçe çaven xwe gerandin, vvek ku li avdestxane an jî ü ciye telefonan bigeriya, le vve ciyekî ji bo rûniştine dixwest.

Evv li keleka pencera mezin bi du masan dûrtir rûnişt.  
Keçe ji çenteye xwe ye destan pirtûkek derxist û piştî ku  
du se caran li rûye Dara nerî sere xwe xist nava rûpelan û  
Xwede giravî dest bi xwendine kir.

Nalenala daran û guveguva baye har hatin birrîn û nema  
gihaştin hundire çayxane. Dara jî nema xwe bi tehna sere xwe  
dît. Wî dîsa jî rahişt pirtûka ber xwe û vvek ku tiştêk je re nemabû  
vvî evv giş bbcvenda, vvî pelen davvîn je xwendin. Nerî-  
nen vvî di ser gotin û rezen ristan re çûn be ku vvî tiştêk bidîta  
û ji xwe re got: "Baş e, pir baş e. We dikarîbû li hezar ciyen  
din bimaya, dikarîbû li paş stûnekî rûništa, ma stûn ji ve çayxane  
kem in? We dikarîbû li qate jerîn jî bimaya. Le maseya  
keleka min helbijart. Ma ji ve yeke baştir?"

Piştî demeke, vvî dest pe kir di ber xwe de, di bin çavan re  
U keçe nerî, paşe vvî hinekî nerînen xwe eşkere kirin. Wî divat  
di serma vve roje de ji mehîna eşe peya bibûya. Jineke vvek ya  
51

li hember vvî dermane dilan bû, xewnek pir kevn bû û anuha  
belkî ber bi gevvdebûyîne diçû. Wîji xwe re got ku keçe ji qazî  
ve sere xwe xistibû ber xwe û vve beguman tiştêk ji naveroka  
pirtûka xwe fehm nedikir. Wî di sere xwe de berdomand:  
"Eğer dile vve nexwestiba, evv e li mala xwe jî bimaya. Ma kî ji  
mala xwe di rojek vvek ve roje de derdikeve!"

Tiştêkî ji destpeke de bala vvî kişandibû, hiştibû ku vvî ne-  
ma bizanîbûya gelo evv heşyar bû an hena di oda xwe de di  
nav ciyan de bû. Evv tişt evv bû ku evv keça civvan pir bi ser Lî-  
za ve diçû. Por, peşanî, ebrûh, mijank, çav, lev, çen, rûhinarik,  
hemû yen lîza bûn. Le eğer Lîza surete dîvvarî nîv tazî bû

li ser xîza perava giraven başûr bû, keça li hember vvî rûniştibû kincen zivistane bi ser bejna xwe de kiribû.

Di vvan salen davvîn de, ere Dara bi vvelet difikirî, car caran li tirena xewnan sivvar dibû û vedigeriya cî û vware zaroktiye, le evv bi gelek tiştên din jî xerîk dibû û dadiket. Yek ji vvan tiştan evv bû ku vvî dixwest li Parîse jiyaneke bi rûmet bidîta. Wî peşî dixwest karekî baş ji xwe re peyda bikira, xaniye xwe xweş bikira, ciyekî fireh ji bo keçek vvek evv keça û hember vvî rûniştî çebikira. Wî gerek piştî xwe bida sitûna aramî, dîvware heminiye. Piştî jinek heja, zencîra tenhayîye e ji hev biketa. Wî bavver dikir ku eğer çareyek ji bo jiyana vvî ya tar û mar peyda bibûya, evv e bi saya karekî baş, jineke baş û dostine baş peyda bibûya.

Wî ji xwe re got ku evv ne cara yekem bû ku evv û vve keçe vvilo pergî hev dihatin û nezîkî hev rûdiniştin. Tene du se gav di navbera vvî û we de hebûn, le evv gaven hane mîna tuxûban je re xuya kirin, mîna sînoren dijvvar li ber rûye vvî man. Wî evv dîtibû, le U kudere? Kengî? Çavva? Wî nikarîbû bersiven 52

vvan pirsan bida. Di vve nave de ji devla dest pe bikira bi vve re biaxiviya û perdeya bedengiye bidiranda, vvî biserhatiya xortekî Kurd anî bîra xwe.

Di şeveke de li Parîse evv pergî Kavoy hat. Evv ne ji mej ve gihaştibû serbajare Fransayê û Kavoy ji ber gelek tiştan bala vvî kişand û piştî vve şeve gelek caran jî hat bîra vvî. Kavoy pirça sere xwe bi rûne ji bo mûyan xwaro maro kiribû, soline reş pir mezin xistibû lingen xwe, tîtik û mîtik bi xwe ve kiribûn û mîna meymûnekî di nav hevalan de diçû û dihat. We roje jî û



derve guvîna bayekî xurt bû. Kurdan xwe gihandibûn hev û her yekî dixwest aloziyen jiyana li sergûne ji bîr bikira û rojen geş bi bîra xwe bianiya. Wilo jî, eğer di nerînen jin û meran de xemgînî nedihat veşartin, kefa Kavoy bixwe li cî bû û her ku evv diliviya evv kefxweşî, evv hezkirina ji xweşiyen jiyane, ji vvî divveşiyen, vvek baraneke ji vvî dibariyan. Keçeke hûrik xwe xistibû bin cenge vvî û hema deste xwe dixist bin çerme çakete vvî vvek ku qefalî bi ser de hatibû. Kavoy vvek masiyekî di nav ave de bû, vvek firendeyekî di nav asmane bextîyariye de bû. Nezîkî davviya şeve, vvî bîstikeke xwe ji nav lep û navperûşken hevala xwe denrist û ber bi Dara ve hat. Wî deste xwe danî ser mile vvî û bi nermî evv ber bi masen xwarin û vexwarine kiribû. Ji bo şeve, jinen Kurd nane vvelet û hemû çeşîten xwarinen kurdî çekiribûn. Wan senî û tebsîk li ser masak direj rez kiribûn. Kavoy kûfteyek rada deve xwe û deste xwe direjî şûşeyek bîra kir û evv bi ser gevvriya xwe dakir. Li ber masa carine vvî got: " Heval tu beguman ne ji zû de ji vvelat derketiyî. Ev yek di nerînen te en gundiyan de eşkere ye ".

Dara got ku rast bû evv ne ji demeke direj ve gihastibû Fransaye. Evv bi nezîkî deh panzdeh malan re, bi saya r&risti-

53

neke ji r&ristinen parastina mafen mirovî ji kempek penaberan hatibû. Ji ber ku debara vvî li bajare biçûk nedibû, vvî bere xwe dabû Parîse, bajare ferheng û hunermendiye. Dara e direjtir bikira û belkî li ser gelek tiştên jiyana xwe ya kesane jî bipeyiviya le Kavoy evv yek nedixwest û di nav leven xwe de keniya û got:

- Baş e! Ev yek li ser ser û çaven min. Ez ji binî ve ne li dijî

çand û kûltûre me. Le malavayo, tu vvilo li min û hevala min meze dflcî tu dibejî qey te kes bi çaven sere xwe tucarî nedîtine. Dara bi van gotinan sor bû. Rast bû vvî li vvan herduyan nerîbû ji ber ku evv cara yekemîn bû vvî tişteki vvilo bi çaven sere xwe didît. Wî dizanîbû ku tişten vvilo ü bal Evvropayîyan, nemaze li bal Inglîzan hebû, le vvî nikarîbû bavver bikira ku Kürdeki dikarîbû xwe texista vvî kirasî, zencîr bi çakete xwe ye çermîn vekirina, guhar texistana guhen xwe.

Kavo rahişt kûfteyek din, bi behntengiyek diyar evv cût û daqurtand:

- Tu dizanî min dikarîbû ji binî ve guh li te nekira, le ez nizanim cima hema vvilo dile min ji ba Xwede ji te re vebû.

Kavo çend qurten li dû hev li şûşa xwe xist û berdomand:

- Ez jî vvek te bûm dema ez ji vvelet hatim. Le min tişteki nas kir û vvî tiştî gelek derî di rûye min de vekirin. Min nas kir ku mirov li ve dere gerek vvek lastîkc be, ü gor baye dem û serdeman be. Mirov dive mîna zilğ nerm be. Eđer tu bixwazî mîna min ciye xwe di ve jiyane de bibînî gerek e tu vvek lastîke bî, vvek mar bî.

Wî deste xwe ji hevala xwe re bilind kir û ji Dara re berdomand:

54

- Xuyaye tu be heval î. Keçen ve dere ji xortan nerm, vvek lastîke nerm, hez dikan.

Paşe evv hinekî di ber xwe de kenîya:

- De li hevala min biner çavva evv beyî min maye!

Kavo bi rastî be xem dbnîya. Wî beguman jiyana xwe bi ya tu kesî nedida, tiye xwe di nava civate de ji hemû alîyan saz

kiribû. Derengî şeve bû û sere vvî baş germ bûbû, le vvek ku vvî dbtvvest ji destpeka de tişteki giring ji Dara re bigota û evv yek ji bîr kirbûya, vvî car din deste xwe danî ser mile vvî:

- Birako tu e rojeke bi ya min bikî û dîplomateki mezin vve ji te derkeve. Ev yek U ser rûye te xuyaye. Li vî vvelatî tene kesen nerm, vvek lastîke nerm, dikarin bigihen miraden dile xwe. Zimane direj û nermbûyîn pir bi kerî mirovan ten. Ve yeke ji bîr meke ha!

Dara di çayxane de rûniştî bû û gotinen Kavoy xweş dihatin bîra vvî, di sere vvî de dikirin zingînî. Wext derbas dibû û keçe car caran sere xwe ji pirtûka xwe radikir, li saeta xwe an li rûye vvî ye zuha dineri. Dara bavver kir ku vve ji nişka ve je re got: " Hişko, serhişko, ma ez cima nezîki te rûniştîme? Ma ne ev yek ji bo te ye, kero?". Le we li pirtûka xwe dineri û eşkere dikir ku evv e di demeke nezîk de rabûya, eğer tişteki ji Dara çenebûya.

Dara jî divat rabûya ser xwe û bi zimanekî xweş, bi zimanekî nerm bigota:

- Xanim bibuhure eğer ez te aciz dikim. Dile min di serma ve roje de hebû ez hevaleki bibînîm. Le vaye em pergî hev hatîne û wext anuha ne wexte hevalan e. Em dikarin hineki bi hev re biaxifin, eğer wexte te hebe?

Ere, gerek bû evv bi ve nermayiye xwe bi ser sere we de  
55

xwar bikira û e çetir buya eğer vvî berdevvam bikira:

- Ez jî ji pirtûkan hez dikim û pir dixwînîm. Tu kîjan pirtûke dixwînî? Wî e paşe li rûye vve bineriya û bikeniya. Evv e bikeniya ta ji vve re xuya bikira ku evv xortekî bi xwe bavver bû.

Kavo je re û ser pirsâ jinan gotibû ku kefa vvan ji xortên rûtirî ş û xemgîn re naye û vvî gerek we roje je re xuya bikira ku vvî nizanîbû ne serma heye, ne jî tenhayî heye. Di şuna baye dikir vîzevîz gerek vvî je re bida xuyakirin ku bilbil û şalûran avvazen jîn û evîne li bexçeye Cluny dixwendin û vvan bextewerî û dora vvî belav dikirin. Paşê vvî gerek destur je bixwesta û bigota:

- Ez xwe bi te didim naskirin. Nave min Dara ye, Daraye Dihokî. Wek ku nave min nişan dide, ez ji bajare Dihoke me. Ez kurd im û ev heye çend sal ez hatime Parîse. Ma ez dikarim hinekî li hember te rûnem?

Keça pir civvan ji ber nermî û nazikiya tevger û gotinen vvî nedibû bigota na. We e destê xwe ber bi ciye li ber xwe bikira û bi fransiya xwe, bi vvî zimane nerm û xweş e bigota:

- Je vous en prie (Fermo, ez reca dikim) Ere, vve ji vvî di serma vve roje de reca bikira. Fransî di dan û standinen xwe de pir xwedî ferheng û zanîn in û beguman e û bave vve evv mezin kiribûn ta ku evv bi avvakî xweş û dilnişîn bi kesên dora xwe re bijiya.

Ere, vve e bi destê xwe ye spî û nazik ciye li hember xwe nîşanî vvî bikira. Paşê vvan e dest bi axiftinek xweş bikirana. Gotine e gotin bikişanda û bavveriya keçe e bi Dara bihata.

Axiftin e pir xweş bibûya û serma di nava Dara de jî bihata şikestin.

Kavo ji xwe re reyek dîtîbû dema digihaşt keçan. Wî dile vvan bi revvşa Kurdan dişevvitand, li ser her çar perçeyên

56

Kurdistane diaxivî û ji vvan re xuya dikir ku mana Kurdan û qirandina vvan bi destê vvan ve bû. Wan keçan ji nişka ve xwe

didîtin, di sere xwe de dibûn tişte, bi deste miletekî perişan  
û jihevketî digirtin, evv ji zîvariye, ji demen zordariye azad û  
reha dikirin. Piraniya caran vvan keçan xwe di davviya şeve de  
piştî şûşek an du şûşeyen seraba sor û çend çbcaren heşîşe di  
nav ciyan de didîtin. Dotira roje, evv radibûn û bi serekî giran  
bi kar û baren xwe dadiketin. Wan şoreşen Kurdistane ji bîr  
dikirin, evv ji keçine din re li dû xwe ve diniştin.

Kavo herdem bi nermî reyek ji xwe re peyda dikir le Dara  
e çi ji xwe re bikira keys ta xwe nezîkî vve keça dilrevîn biki-  
ra? Wî e çavva ji alîyekî dile vve bi hale xwe bişevvitanda û ji  
alîyekî din jî kefa vve bianiya. Her çar perçen vvelat bixwe  
herdem di vve navbere de di vve revvşa kambax de bûn. Wî di-  
karîbû jî bi direjayî li ser serîhildana Berzanî, an Şex Mehmûde  
Berzencî biaxiviya. Wî dikarîbû bi avvayekî xemgîn U ser  
komara Mehebade ya ku saleke berdevvam nekir û li ser kuş-  
una Qazî Mihemed biaxiviya. Helebçe hîn çetir bû çûnku di  
vvan demen davvîn de hena behna mirine ji laşen li ser erde  
direjkiî dihat û televîziyon û rojname li ser evvren xerdele rûniştibûn.  
Di nav kolanen tengik de, li ber deriyen xaniyen weranbûyî,  
li ser reya reve, jin, mer, zarok vvek pez6 ku qotik  
lexe, an mirişken bi eşe bikevin hatibûn ramidandin, zike vvan  
tileri bûbûn. Bavan xwe bi ser zaroken xwe dinuxumandin,  
dbcvvestin evv ji mirine biparastana, le baye xerdele bedeng  
xwe li her dere dipeçand, erd û asman dîxist bin deste xwe. Ji  
ber ku Dara ji Dihoke bû, vvî dikarîbû li ser Koça Mezin jî biaxiviya,  
li ser Kürden xwe li tbcûban dbcistin û ji her alî bi gulleyan  
dihatin kuştin. Du se mihyon kes dev ji malen xwe

berdidan, ji ber savva mirine direviyan, ber bi rojen vwindabûne  
û serdemen kuşdaran diçûn. Du se miliyon jin, mer, zaro,  
kal, pîr ji nişka ve dibûn parsek ü deriyen Evvropaye bi de-  
sten qirejî, bi leven qelişî dbdstin, dikirn gazî. Kurd herdem  
mîna sevvîyan bûn, deste vvan vveke beren zingarî herdem direjkirî  
bû, li ber dîroke vekirî bû û Dara dikarî bû U ser van  
tiştan bipeyiviya

Paşe hat bîra vvî ku Kavoye re gotibû ku ne baş bû ku he-  
ma vvî perişaniya miletekî rez bikira. Gerek bû vvî zû demen  
şevvatan li paş xwe ve bihiştana û dest bi gotinen xweş bikira-  
na. Gerek Dara li ser tiştan xweş biaxivîya, li ser fîlmekî sine-  
maya an jî şanoyeke. Le evv ji mej ve neçûbû tu sînemaye û  
çûyîna şanoyan ne tişteki ewqas hesan bû.

Dara bi xemgîniyek diyar nerînen xwe li ser çiqilen ku car  
din dikirin carecar gerandin û paşe sere xwe xist ber xwe. We  
roje, vvî dikarîbû ü ser xwe, tene U ser xwe jî biaxivîya. Cima  
na? Wî dikarîbû bi direjayî li ser tenhayîya xwe, serma ku di  
hestiyen vvî de diçû xware bipeyiviya. Ji derveyî pirsê vvelet û  
sergûne, sereşen mirovan jî hene û vvî dikarîbû derden merêkîji  
jineke re bigota.

Keça civvan li saeta deste xwe nerî, û vvek ku sozek vve he-  
bû û evv e dereng biketa vve bi lez rahişt çente xwe û daket. Ji  
Dara re xuya bû ku qurpequrpa paniyen vve ji hundire çayha-  
ne derneketin. Wî dît çavva Lîza li jera pelika jerîn ravvestiya,  
kincen xwe en zivisatanî ji xwe kirin û xwe li ser xîza nerm car  
dî ramidand. Vve şûşa xwe ber bi deve xwe ve bir û dîsa dest  
bi kene xwe kir.

Dara peren qehwa xwe li ser mase hiştin û rahişt çente

xwe. Qate jer herdem vala bû û garsonan hena ji xwe re he-  
58

nek dikirin, xwe bi ser hesine bare de xwar kiribûn. Dara car  
din li ber Lîzaye ravvestiya û bi xemgînî le nerî. Dema vî pişta  
xwe da vve û evv ber bi derî ve çû gotina "hişko", "nenermo"  
car din li ber guhen vî ketin. Li derve, vî li havvîrdora xwe li  
bajare sar nerî. Di bexçe de, daran bi dengê ketî dikirin carecar  
û nizanîbûn çavva xwe ji ber hovîtiya baye vve roje bidana  
alî. Li ber çaven Dara gelek xorten vvek Kavo xuya bûn,  
vvan geh bi nermî, bi diplomasi ji hev re xweş dikirin, geh qîlen  
xwe di canen hev de radikirin, herdem bi nermî û diplo-  
masî. Hemvelatiyen vî ü ber çaven vî geh bûn vvek pisîkan  
xwe di nav dîvvaren Parîsa tevlihev de vedişartin, geh bûn vvek  
sehen har û hema dixwestin îlaşe hev bidirînin. Dara di vve gawe,  
di dijvvariya vve tenhayîye de pir beriya rûye dayika xwe û  
desten bave xwe kir. Wî beriya xwehen xwe, birayen xwe, dös-  
ten xwe kir, ta bîra dînen bajare xwe kir.

Wilo jî, eğer berî deh salan ji vî bihata pirsîn: " Gelo çi tişt  
hevv je di bin stûna asmanan de ne xweştir heye ?", vî e di cî  
de veğerandibûya, be ku pir zimane xwe di deve xwe de bigeranda:  
" Evv be vvelat mabûn e, evv ji wekat dûrketin e ". Le ji  
deh salan û vir de û nemaze di sermaya vve roja hane de, eğer  
hem evv pirsîsa hane ji vî bihataya kirin, vî e beguman, bersiva  
xwe bi avvayekî din bida.

59

deriye vekirî

Di vvan salan de, di navbera 76 an û 80 eyî de ez ü Parîse  
dimam. Odeke min teng û tarî hebû û ez li we bi cî û vvar bûbûm.

Evv di avahiyek kevin de li nezîkî îstegeha metroya La Muette bû. Ji rojan rojek zivistane bû û ez gelekî vvestiya bûm. Min xwe ü ser ciye xwe direj kiribû. Ez li heviya xewe bûm û xew jî e vvek horiyeke, periyeye ji periyen buhuşte bi-hata. We seriyek e li min bida, çaven min bi dîtina xwe nerm bikirana. Evv e bibûya şerşefek hebirmeşî xwe li laşe min ye vvestiyayî bipeçanda, evv e bibûya dilopen xweşiye û dilop dilop xwe berdaya nava pahken çaven min. Pelen germe ji lülen chauffage derdiketin ber bi zike ode hildikişiyân û dadiketin, ber min ve dihatin, min ber bi xeweke giran û şîrîn ve dajotin. Min vvilo dile xwe bi xewe xweş dikir û ez e beguman razama 60

eğer ne ji Seydo buya. Di deste we roje de, di we Parîsa tevlihev de, Seydo li deriye min xist. Wî xwe li min girt, xwest ku min, rebene Xwede, min di ber dile vvî de bida, di vve cihana girtî de deriyek, pencereyek di rûye vvî de vekira.

- Kî ye? min bi fransî got

- Ez im, mamoste, ez im Seydo, vvî bi kurdî vegerand.

Min li hemvvelatiye xwe mûn dikir û ji ber ve yeke, ez ranebûm ser xwe û min ji nav ciyan bang kir:

- Seydo deri vekirî ye. Derbas be!

Di şeva buhurî de ji binî ve xew bi çaven min nebûbû. Min li garajeke, li derveyî Parîse, U Bagnolete kar dikir. Di şeve gişî de kemyon dihatin û diçûn, malen giranbuha vala dikirin û bar dikirin. Şuferen vvan diketine şuna hev, en servîsa xwe tev dikirin, çav U xew, bi lez ber bi malen xwe ve diçûn, en nû dihatin U keleka mekîna xwekar ya vexwarinen sar û germ qehwa xwe vedixwarin û berdidan xewe. Min kaxezen male



barkirî didane deste vvan û bi vvan kaxezan min evv bi re diki-  
rin.

Seydo buhurî hundir û ji ber serma derve vvî bere xwe da  
chauffage, tiliyen xwe di ser lülen ava germ re birin û anîn. Ez  
ji nav ciyan cenk bûm û min bere xwe da destşoke. Min herdu  
desten xwe di bin şirava sar de direj kirin û min re ji tevezînoken  
sar re vekir. Ez li destmale negeriyam û min ser çave xwe  
zuha nekir. Min hinekî xwe li ser texte razane direj kir, û ta  
ku xew bi derine din de biçûya, dev ji min berdaya, min rahişt  
kasete li ser mase û min evv xist teype. Denge dudûke ji kasete  
stiranen Kürden Soviyetistane derket, ji dûr ve hat û di na-  
va odeye de tev li pelen germe bû.

Min behntengî li ser eniya hevale xwe xwend le min xwe

61

ragirt. Min je nepirsî vve roje çi bûbû, çi bi sere vvî hatibû ta  
vvî bere xwe di sibeha zû de dabû min. Wî helbet dizanîbû ku  
min bi şevan kar dikir û bi roje ez radizam. Wî dizanîbû jî ku  
saet ne saeta serledanan bû, le bi xwe nikarîbû, ji ber coşa  
dilgermiya di nava xwe de beguman debar nekiribû. Wî eşkere  
li min nedineri vvek ku şerm dikir nerînen me rastî hev bihatana.  
Wî dizanîbû, bi ser de jî, ku di evara roje de ez e dîsa  
biçûma ser kare xwe. Evv ji ber chauffage rabû, û ser sendeliya  
li ber mase rûnişt, deste xwe direjî teype kir, denge vve  
hinekî bilintir kir. Denge dudûke xweştir xwe di nav pelen  
germiye de direj kişand û vvî em bi xwe re dûr xistin, dûrî jiya-  
na Parîsa tevlihev birin, bîranînen me di seren me de U hev  
xistin.

Ez bi tenha sere xwe di vve ode de dijiyam û vve tenhayiye

re li ber hevalan vedikir ku vvan be telefon û be soz kengî bixvvestana dihatin. Se salen min di vve ode de derbas bûbûn.

Her ku ez vedigeriyam an ji male derdiketim, ez di penc deriyan re derbas dibûm, ez bi sed û penc pelikan hildikişiyam an dadiketim. Ji öden hemsaye û cîranan behna xwarine herdem xurt dihat. Le evv behnen xurt, nemaze behna xwarinen resen Afriqiyaye, nema sere min gejt dikir. Ez hînî vvan bûbûm, vvek ez hînî barane bûbûm, evvren reş û giran, metroye, xwaringehen ji bo xwendevanan û vvan nivîsen nejadperestan li ser dîvvaran "Fransa ji bo Fransiyayê. Biyanîyen gemarî veşerîn vvelaten xwe".

Ava min û ser çaven xwe kiribû hin bi hin berdida xewe, le piştî şevê zehmet, xew vedigeriya û pelen xwe bi gîr û engirîn bi ser min de dadiweşandin. Seydo deng nekir, le evv bedengî di sere min de ji axiftine xurtir bû. Evv mîna xumexuma  
62

lehiye bû, vve bere xwe da bû oda qate heftan, min û ber xwe dibir. Seydo herdem xwîngerm bû, dixwest her deqê dînya xera bikira, evv li ser bingeha bîr û bavveriyen xwe ji nû ve ava bikira. Le dema evv li ser sendeliye rûnişt, gotin pûç bûbûn, beçare bûn, nikarîbûn we roje bi kerî vî bihatana. Seydo çivîkekî qels bû ji ber ba û bahoze, ji ber dijvvariya rojen dîrbûne xwe avetibû oda min, xwe U hemvvelatiye xwe girtibû. We roje, evv vvestiya bû, ji her tiştî vvestiya bû. Wî davî deve xwe vekir û di nav denge stiran û avvazan de denge vî şist û melûlî gihast guhe min:

- Mamoste, min do dev ji kare xwe berda.

Min Seydo di civîneke de, di jera avahiyek kevn de li taxa

Pigalle nas kir. Kürden Parîse evv xaniye mîna şikefte ji xwe re dîtibûn, kiribûn komele û le civînen xwe çê dikirin. Wan li vve dere derden xwe ji hev re digotin û li bember erîşen çavsoriye, hovîtiye, piştta xwe bi hev xurt dikirin. Ez nû gihastibûm Parîse û evv cara yekemin bû ez diçûm we dere. Ji nav hemû xortên rûniştî, Seydo betir bala min kişand. Evv ji me gişan biçûktir bû û di serma vve zivistane de, di nem û şiliya vve şikefte de, vî çaketekî havîne avetibû ser mile xwe û ji şervvale vî ye tenik û qermiçî min nas kir ku evv tu cari nedihat ûtî kirin. Berî civîne, me xwe bi hevdu da naskirin. Min je pirsî gelo evv xwendevan an karker bû. Wî bersivek diyar neda ber rûye min. Pirsî min naxwe bersiveke direj dbcuvast. Seydo ji min re bi direjayî rave û rohnak kir ku evv bixwe hena ne xwendevan bû, ne karker bû evv di navbera erd û asimanan de bû. Evv jî vvek nûn ne ji mej ve gihastibû Parîse û dixwest bixwenda. Peşî vî e zimane fransî baş bixwenda, paşe evv e biçûya xwendegehe, heft heyşt salan textorî bixwenda ta ji vî

63  
textorekî heja derketa, textorekî ji bo zarokan. Le ji ber ku jiyân li her dere û bi taybetî li Parîse be pere nedibû, vî hevî dikir di ber xwendine re karekî hesan peyda bikira, karekî ku pir wexte vî nebira û evv ji hevalan û ji xebate jî dûr nexistiba. Di we şikefta sar de, min je nepirsî vî sar bû an na. Di nav vvan çeken sivik de, vî xwe mîna keroşkekî qurnisandibû, se-re xwe xistibû nava milên xwe û diranen vî li hev diketin. Civîn teva bûbû nebûbû nûn je xwest em bi hev re herin tiştêkî germ vexun. Min qapûte xwe daye ji ber ku min vezele û çaketekî germ li xwe kiribû. Wî qapûte min li xwe kir û me bere

xwe da qehwexaneyeke. Tar tara qehpik û gevvendan bû. Li sere kuçe, du se qehpiken ji vvelate Muxribe bang revviyan di-  
kirin. Wan girre xwe di me jî dan, çav dane me û ji ber ku pore me reş bû, vvan bi zarava xwe jî tiştine gotin, le em di vvan gotinan negihaştin. Min qehwak xwest û Seydo qedehek me-  
zin şîre germ. Wî peşî qedeh di nav tiliyen xwe de guvaşt, li germahiye geriya. Em demeke direj bi hev re man, û ser şoreşen cîhanc û revvşa mirovan axifîn. Di nav pelen germe û du-  
mana çixaren pir de, dostaniya me dest pe kir rîse xwe bada. We bingeha xwe û ser serma dûrbûyîne, dijvvariya tenhayîye û li ser dîlpakiye danî. Seydo herdem hevalekî min ye zaroktiye dianî bîra nûn. Bi vvî hevalî re hezkirina me ji başokan û ji çiyayen bilind re roj bi roj mezintir bûbû. Piştî Koça Mezin, me bere xwe dabû sînor û tbcûben jiyane nû û mîna keriyekî pez, em terqîya bûn, li bajare sergûne belav bûbûn. Li vve çayxane nûn û Seydo me navnîşanen xwe dane hev û dema min xatir je xwest, evv ji ber min rabû. Temene min ji ye vvî bi se çar salan betir bû û belkî vvî jî di rûye min de rûye hevalekî biçûkaniye didît. Wî rûmeteke bilind da min, deste min bi  
64

hers hejand û hişt ez le ecebmayî bibûma. Di vvî îlaşe ziravokî de, di vve bejna hûrik de, hezek pir xurt hebû, agirekî peketî, hezkirineke mezin ji jiyane re hebû.

Di odeya min de, di vve roja zivistane de, nezîkî se salan di ser hevnasîna me re derbas bûbûn û min bala xwe daye ku kincen hevale min herdem ji bo serma zivistana Parîse nedibûn. Piştî se salan tu guhertinen mezin, guhertinen ber bi çav, di jiyana me herduvvan de çenebûbûn. Min herdem bi şev li

garaja kar dikir û Seydo bi şev û rojan ji ser mekînen dirûtine û ûtîkirine ranedibû. Evv hena ne hînî zimane fransî bûbû, ne dikarîbû biçûya nave xwe li xwendegeha textoriye binivîsanda. Xew jî geh dihat geh diçû. Seydo li ser sedema hatina xwe vve sibeha zû bi şevveyekî ne eşkere peyivî:

- Min dev ji kare xwe berda, ji ber ku ez naxwazim xwîneke li vî vvelatî texim hustuvve xwe.

Bi gotina "xwîne" xewe xwe bi ghiştî ji ser çaven nûn vekişand. Min deste xwe direjî teype kir û deng hinekî kem kir.

Min Seydo nas dikir û dizanîbû ku vî dikarîbû bi hesanî xwînek bbdsta hustuvve xwe. Min je pirsî:

- Xwede bike tu û xwedane kar hûn ranebûn hev?

Seydo û deh duvvanzdeh Kurdan li bal Kurdekî bi nave Remo dbcebitîm û vî Remoyî pir evv deşandin, peren vvan dixwarin, kaxezen vvan çenedikirin. Wî bi sed caran soz dabû Seydo ku kaxezen vî çebikira, le ji bîr dikir an jî hesabdare vî nexweş diket, diçû deverine din, kî dizane....

- Lavve kuçikan her roj digot îro sibe îro sibe. Bi ser de jî evv anuha dibeje nikare peren karkeran bide vvan , Xwede giravî ji ber ku bank e desten xwe bidin ser mekînen vî. Ev ne

65

cara peşî ye ku evv vî kari dike, kargeheke digire, yeke din piştî heftiyeke vedike.

Min li Seydo nerî û nizanîbû çî bigota. Evv ü jiyaneke çîlo digeriya û pergî çî dihat? Wî vvelat û demen eşe li dû xwe hiştibûn, hevîdar bû jiyaneke bi rûmet, dunyayek xweş, be sereş U dereke peyda bikira û li Parîse evv ketibû nava gur û roviyan. Dema evv diaxilî, peyven vvek "azadr, "rastî", "revşek xweş",

"mafen mirovan", "gelen bindest" herdem dihatin ser zimane vvî. Wî bi sedan naven nivîskar û feylesûfan dizanîbû, pirtûken vvan bi rastî xwendibûn. Li Parîsa tevhev heviya vvî evv bû ku vvî karekî hesan peyda bikira û di ber re jî bixwenda, hema bixwenda û bixwenda. Le mbcabin, ü paytexte hüner û zanîne, Seydo hema kar dikir, ji sibehe ta evare ji kargehe dernediket. Wî ji jiyane dixwest vve deriyek di rûye vvî de vekiraya, le dîvvar li dora vvî pir dibûn, bilind dibûn, digihaştin peren asmanan. Di oda min ya teng de, di vve roje de min dît ku Seydo ji gotinan vvestiya bû. Bi ser de jî evv birçî bûbû. Wî ji min pirsî:

- Mamoste, ez hinekî birçî me. Xwarin çi li bal te heye?

Ji ber kare xwe ye şeve, min wext nedidît biçûma mexazeya mezin xwarin ji bo du se hefteyan bikiriya. Paşe min piraniya caran Ü sifrexaneya garaje dixwar. Min dizanîbû tişteki heja di sarkera min de tunebû le min li Seydo mûn dikir û ta ku vvî xwe di mala xwe de xwe bidîta, nûn je re got:

- Li sarkere biner. Ez e jî gepek nan bi te re bixwim.

Û hat bîra min, evv roja min bere xwe da mala vvî li tara "Montreuile". Wî gazin ji nûn kiribûn û bavver kiribû ku çi ye ne çi ye min li xwe danetanî biçûma mala vvî," mala karkerekî kurd". Wî hinekî bi xeyd jî ji min re got "Mamoste, ez tem  
66

mala te, nane te dixwim, le tu xwe giran dikî. Wilo nabe". Wî bang nûn dikir û digot "Mamoste", tevî ku nûn tu carî mamosteyî nekiribû. Wî nave nûn kiribû " Mamoste", hin ji ber ku kefa me ji hev re dihat û hin ji ber ku min çend salen xwe bi xwendine derbas kiribûn, beyî ku nûn tişteki bi ser bbdsta. Wî

beguman jî vvilo bang nûn dikir ji ber min baş bi zimane fransî dizanîbû û dema karekî vvî bi zimen dihat vvî bere xwe dida min. Li tara Montreiule, Seydo bi se karkeran re di xaniyekî biçûk de dijiya. Wî bi vvan re her tişt li xwe pahr dikirin, çî ji kiriya xanî, çî ji pere elektrîke, çî ji paqijkirina hundir buya. Evv ü male li ber deve derî li heviya min bû û bi rûyekî bi ken, bi kefxweşiyek diyar, ber bi min ve hat, û deste nûn bi hers guvaşt. Wî çay amede kiribû û piştî çaye vvî se çar çeşît û texlîten xwarinan di navbera me de danîn. Min nas kir ku vvî vve roje baş sere xwe bi amedekirina şîve eşandibû. Li ser carî- ne em pir nepeyvîn û vvî hema senî ber bi min direj dikirin, herdu lîvvanen ber min yek hema tije seraba sor dikir, ya din nûşt devvekî ter sîr û xwe dikir. Piştî şîve, vvî seniyek peqlawa ku beguman ji taxa Strasbourg Saint-Denise kirîbû li ber nûn danî. Li bendî çebûna çaya piştî şîve axiftine bi rastî dest pe kir. Em -ez dixwazim bibejim Seydo ji ber ku vvî vve roje re yek car neda nûn-, em li ser revvşa xwendevan û karkeran kurd h derveyî vvelet bi direjayî peyvîn. We roje, Seydo jiya- na xwe, daxwaziyen xwe, tirs û savvîren xwe hemû ji nûn re gotin, li ber min raxistin. Em bi hev re vegeriyan. Me gazî teyre Sîmir kir, me je xwest evv me baveje ser pišta xwe, me bigihîne vware evîne, dînya şadiye. Em nezîkî navçeye bûn. Li vve dere, em bûn mîna başokan û me xwe berda xware. Di şuna xweşî û şahiyê de, sînoren şevvatan U ber çaven me xuya bûn,

67

behna mirine em gejj kirin. Axiftine em hin bi hin ajotin nava demen çavsoriye, meqeresiye, zordariye, bi kurtî nava rastiya tiştan û dile me herduyan bi me şevvutî. Seydo li ser zaroktiya

xwe li gund peyivî. Evv li ser nevalen heshesûk û rezan, li ser gole, li ser agire di havînan de ji asmanan dibariya û li ser diyvvariya jiyana karker û palan axifî. We roje jî, Seydo li ser mafen mirovî, li ser jiyana bi rûmet, jiyana xweş bi direjayî peyivî. Wî nizanîbû evv jiyana li kudere bû le vvî evv jiyana dixvvest û heviya xwe je nedibirî. Wî digot ku vvî dizanîbû ku ni- karîbû bi arteşa nezanebûne û bi demen xwînxwaran le evv herdem hevîdar bû bi kemanî tiştê bigihanda jiyana gele navçeye. Min le guhdarî dikir û ta min hinekî di ber dile vvî de bidaya, nûn bi henekî got: "Seydo, te çay li ber me danî û te xwe ji bîr kir. Ma tu çaya xwe venaxwî berî sar bibe?" Bixvve çaya vvî ji mej ve sar bûbû, le vvî evv bi kerxweşî vexwar, qedeha tije kir du se qurt.

Di oda min de pelen germe vvek perdeyek hebirmeşî di bin zike ban de xwe li hev dipeçandin. Min divat di ber dile Seydo de bidaya.

- Kürden ku ji bo peran bexte xwe reş dikin, derevvan ü kesen dora xwe dikin pir in. Demen diyvvar hovîtiya mirovan dadixîne meydana. Le ez bavver dikim te karekî din peyda bikî.

Û hat bîra min gotinen vvî di roja yekemin de, "karekî hesan", û nûn vvilo jî berdomand :

- Dive tu karekî hesan bibînî ta di ber re bikaribî bixwînî.

Min ev peyven han gotin be ku bi rastî bavveriya min bi vvan bihata. Piraniya me di nav karen zehmet û xeternak de xwe vvinda dikirin. Tene kesen dizanîbûn xwe li her dere bifiroşin, xwe bi her kesî şelaf bikin, ji bo revvşa diravî xwe nezîkî

68

şeytanê jî bikin, evv kesen han bi avvayekî cûda dijiyan. Cî ji



yekî vvek Seydoye dilpak, nefsbîçûk û xwedî bavverî ne di bin asmane Parîse de, ne ü tu deren din nebû. Seydo vve roje ne- ma dikarîbû di ber xwe bidaya, evv revvşa li ser derevvan hatibû avakirin hilgirta. Gerek bû min bala vvî dûrî vve rastiya em te de dijiyan bibira û vvilo jî ez rabûm ser xwe û bi kefkvveşî min got:

- Seydo, hinek çaya vvelet ji nûn re hatiye. Tu çi dibejî? Wî tişte negot, le hinekî di nav leven xwe de bişirî. Rojêke, ez çûm Seydo li ciye kare vvî bibînim. Wî hinekî bi henekî hinekî bi rastî ji min re gotibû "Mamoste, tu dibejî tu ji nivîsandine hez dikî, tu xwe nivîskar dibînî, le tu tucarî neketiyî nava jiyana karkeran. Ez anuha li ser mekîna dirûtine kar dikim. Bi kemanî vvere, vvere bi çaven sere xwe bibine jiyana Kürden me U Parîse çavva ye. Ji ve taxa bircivvaziyên hinekî derkeve û bide nava jiyana rast. "Evv tişte hane ne rast bû û ez ne wîqasî dûrî jiyane bûm, le me soz da hev û vvilo jî nûn bere xwe da îstegeha Bonne Nouvelle, îstegeha nezîkî ciye Seydo le kar dikir. Ez li navnişane ker û gejbûm û ez bi ser we ve nebûm. Min reya xwe ji se çar kesan pirsî ta davvî nûn evv peyda kir. Di nav kolanen teng û gemarî de, li sere kuçan, Kurd, Türk, Hindî, Afrîqayî, Ereb bi rûyen nekurkirî, bi behntengî dipeyvîn, roje gişî ü heviye bûn xwedanên kar bihatana, keda vvan ji bo roje bikiriyana. Tar ji binî ve ne xweş bû û avahiya ku Seydo le kar dikir kevn bû û dîvvarê we ye U cadeye dinerî kavilen xaniyên bexwedî dianîn bîra mirovan. Min deriye derve vekir û ez ketim dalanek reş. Min deste xwe li kilîta lempe pelikand, le nûn tişte peyda nekir û vvek kwîran ez dîvvar û dîvvar meşiyam. Ez rastî pelikan hatim û hedî

hedî, di nav behna text û çimenta şil de ez hilkişiyam. Seydo ji min re gotibû vvî li qate sisyan kar dikir. Dema ez gihaştim qate sisyan, hinek ronahiya ji derve ji külek û rojinan dihat hişt hinekî betir min ber xwe bidîta. Di her qatî se derî hebûn û min deste xwe U deriye deste raste da. Ez çend deqan li ber deve derî ravvestiyam û nûn nas kir ku di qula derî re kesen li hundir li min dinerin. Geleka ji vvan karkeran be kaxez kar dikirin û li Parîse ji vvî kari re dihat gotin "kare reş". Derî vebû û sere Seydo te re derket. Wî min derbasî hundir kir û min bi karkeran hevalen xwe da nas kirin.

Kargeh baş fireh bû le ji ber pîrbûna mekînen terzîtiye, depen ûtîkirine û komen cavve hatibû birrîn evv biçûk bûbû, bane we nizim bûbû. Ez nizanim cima le min di nava xwe de karkeran vve hejmartin û tev Seydo evv di vve roje de panzdeh derketin. Li ser dîvvaren ku boyaxa vvan ji vvan vvek pelen pîvaze rabûbû sûreten ronakbîr û şoreşgeran hebûn. Hin kar-keran sûreten Marks, Lenîn, Mao, Che Guevara li ser dîvvaran xistibûn, hinine din yen Şex Seyîd, Qazî Mihemed, Berzanî, Apo...

Seydo bi mile min girt û nûn ber bi mekîna xwe ya dirûtine ajot. Vvî sendeliyek direjî nûn kir û evv li hember min li paş mekîne rûnişt. Karkeran gişan bi berçe kar dikirin û ji ber ve yeke jî, bej roje gişî û perçeyek direj ji şeve jî evv di nav vvan dîvvaren kurimî de diman. Her yekîji vvan bi kemanî panzdeh bîst hezar dabû kesen ku kaxezen penaberiye ji vvan re çedikirin û ji bîr nedikir ku çaven hemû malbateke li deste vvan bû. Ji bo hatina nûn kesekî dev ji kare xwe berneda. Tene

Seydo hema bi kef li min dineri û bi min re bi vve dilpakiye  
hema dikeniya. Min je re got ku tevî ez li vvir bûm vvî dikarîbû

70

kare xwe berdevvam bikira, le denge me di nav gurregurra  
mekînan de vvinda dibû. VVilo jî ji devla axiftine me di vve kargehe  
de kir qîrîn. Seydo helbet vvek her car xwest li ser revvşek  
xweştir, jiyaneke çetir bi direjayî bipeyiviya le gurrîna bi  
mekînen dirûtine diket dîvvar dihejand û re nedida vvî. Di vve  
navbere de xwedane mekînan Remo ji dereke vegeriya. Wîji  
mecburî silav li min kir, le eşkere bû hatina min ne bi dile vvî  
bû. Seydo di ve yeke de dendst û bi dengekî bilind ji nûn re  
got "Mamoste, guh li vî bebvî neke! Ere evv Kurd e le ji min  
bavver be evv dikare namusa xwe ji bo sed firingî bifîroşe".  
Min leva xwe ya jerîn gez kir û tiliya xwe danî ber deve xwe ta  
Seydo denge xwe nizim bikira, le denge vvî bi zore gihast güne  
min. Min nexwest li vve dere direj bikira, sereş ji hevale xwe  
re peyda bikirana. Ez zû rabûm ser xwe û nûn bere xwe da  
derî. Min li sûreten li ser dîvvaran nerî û ez nizanîm cima vve  
roje nerînen vvan revvşenbîr û şoreşvanan tije xemgînî bûbûn.  
Seydo bi nûn re hat ta ber deve derî. Min ji vvî pirsî kilîta  
elektrîke ketibû kudere. Evv kerûya û vvî evv nîşanî min da. Evv  
di dereke de bû ku bi rastî tu kes bi ser ve nedibû. Li derve, li  
tara Strasbourg Saint-Denise, dînya sar bû û bayekî xurt di-  
kir vîzevîz. Piraniya karkeren biyanî mîna sehen bexwedî di  
kolanen gemarî de diçûn û dihatin, li hev digeriyan, li tiştêkî  
ku peyda nedibû kerr û gejdibûn.  
Ava germ li ser agir coşiya. Seydo li bal nûn vvek li bal xwe  
bû, ciye her tiştî dizanîbû. Wî xwarin ji sarkere dendst û nîv

nanekî direj, nîve baguette nîşanî nûn da û got:

- Mamoste, nane te hişk e. Ez e dakevim nanekî germ bikirim.

Dikana nanfiroş hinekî dûrî ode bû û tevî nûn li Seydo

71

mûn dikir, min nexwest ku evv bi vvan sed û penc pelikan daketa

û car din hilkişiya. Min bi henekî je re got:

- Evv e di nav çaye de nerm bibe. Ma nane tenûre ye kevn

û semûnen bine çadire ji bîra ta çûne?

Seydo mast, dîlmeyen penere "La vache qui rit", (çeleka dikene) û çend üb zeytûn li ser mase danîbûn. Vvî vve roje nexwest henekan bike û got:

- Nane hişk hişk e û nexweş e, çi li vir be, çi li vvir be.

Wî dil tunebû bipeyiviya. Paşe nûn naskir ku ere gevde vvî li bal min bû le bele hişe vvî dûr çûbû, ketibû nava geremol û gerrîneken fikran. Salen zaroktiya li ser benderan, li keleka gola gund, beguman hatin bîra vvî. Wan di serma vve roje de jî germiyek xurt bi xwe re anîn û Seydo piştta deste xwe di ser eniya xwe re bir, vvek ku vvî xwest xwedanek nediyar zuha bi-kira.

Kaseta stiranen Kürden Ermenistane gihaşt davviya xwe.

Bedengiye car din xwe li oda qate heftan girt. Min çaye amede kiribû û ez li hâviye bûm vve dema xwe baş berda. Le ji nişke ve, Seydo rabû ser xwe û got:

- Bubhure Mamoste, dile nûn nema dire xwarine. Dive ez herim.

Evv e bi kudere ve di vve serma hane de biçûya? Di dîvware kîjan jîne de deriyek, pencereyeke biçûk an reyek vve roje di rûye sivvare eşe de e vebûya? Min evv pirs je nekirin ji ber ku

bavveriya nûn bi bersiven vvan, eğer evv bersiv jî hebûna, bixvve nedihat. Seydo tişteki din negot û derket. Bi derketina xwe re, vvî derî li dû xwe vekirî hişt.

Xewe ji ser çaven min bar kiribû, le evv e vejeriya û mîna periyekê desten xwe en hebirmeşî li ser cane min ye şikestî re  
72

bibirana. Dosta min, xewa serîn e bihata, serek li min bida û vve bihiştta min li ser sînga vve hemû kul û derd ji bîr bikirana. Dilber gerek bû bihata û çaven nûn nerm bikirana. Min çaya germ berda destşoke, nane hişk avet û xwarin car din xist sarkere. Min demeke li deriyê vekirî meze kir û evv ji min re mîna nîşancke, reyeke xuya bû. Min peşî ji xwe re got ku Seydo ne tene deriyê oda min vekirî hiştibû le vvî deriyê jiyaneke nû U ber nûn vekiribû. Le evare ez e car din biçûma kar û nedibû nûn sere xwe bi vvan tiştan bieşanda. Min got ku tişteki mezin vve roje di bin asmane Parîse de çenebûbû, asman bi ser sere me de neketibû û em hena sax bûn. Tene hevaleyê be kar ma bû û hinekî xewa min li min herimî bû. Derî jî eğer Seydo li dû xwe vekirî hiştibû, evv jî ne tişteki pir balkeş bû. Ma ne derî çedibin ta ben girtin û vekirin?

73

### HAVÎNA SEYDO

Germa pir bi tîn mîna baranek ji peten eğer bi ser rûye günde li bakure gir dibarî. Zarokan di qîçîna roje de xwe avetibûn bin siya dara tuvve, nezîkî bîra ave xwe vezilandibûn û di nav xwedane de mabûn. Li ber siya kin ya dîvvaran, ü dora qutî û teneken ave, mirişk, qaz, vverdekan ax hinekî bi navperûşken xwe vedabûn û beçare li piçek henikayî digeriyan. Seh

ji ber germa di jvvar ge j bûbûn. Wan xwe bi ser keleken xwe ramidandibûn û zimane vvan ji deven vvan bi qasî bihusteke kişiyabû.

Di agire vve roje de, di kelekela germa vve havîne de Seydo di bin teneka ave de her gav dihat bi ser dev de biçûya xware. Wî bere xwe dabû çadira li ser sînga bendere û kela girî ji qirika vvî dervediket. Evv bi saleke an duduyan ji vvan zaroken

74

bin dare mezintir bû, le bave vvî ji ber tunebûne bi avvakî cihe ü ve yeke nerîbû. Berî ku çinîna geniman dest pe bikira, evv li keleka Seydo rûnişt û bi dengekî nerm ji lavve xwe re got: "Seydo, vaye tu anuha bûyî xortekî serxwe. Lavve min lîstika bi zaroken gund re nema ji te re dibe. Tu nema zarokî ta di nav zarokan de bimînî. Gerek e tu alîkariya male bikî, vvek xortan karekî bikî." Wî di sere lavve xwe de vvilo xwend ta ku Seydo bi rastî bavver kir ku evv bûbû xortek be ku haye vvî ji ve yeke hebûya. Bave vvî havînan dibû barhilgir, çevvalen genim en sed, sed û sîh kîlo li ser piştta xwe dikirin davetin paş kenüyonan, li bajare Amûde an U Qanüşloke dadbdstin. Wî U bal Hecî kar dikir û vvilo jî Seydo bû berdeste Elîke nanpej. Seydo ji nevalen xwe dûr ket, di nava çend rojan de Xwede giravî bû xortekî hivdeh hîjdeh salî û jiyanek nû di rûye vvî de vebû.

Li ser bendere çadira spî hena dûr bû. Seydo piştî ku ji nav dîvveren hevşe derket û deh duvvanzdeh gavan ber bi bendere avetin, vvî teneka giran danî ser erde û xwest hinekî behna xwe berda. Hevalen vvî di bin siya dare de bûn û vvî dixwest her gav hema evv teneke di vve navbere de bihiştta û

biketa nav vvan, bi deste vvan bigirta û bere vvan ber bi gola ave vekira. Ev tişt ji vvî dihat le vvî tucarî nexwest dile bave xwe bişikenanda. Wî vvilo jî car din rahişt teneka tije û bi gavine şist ber bi bermîlen ave en li keleka çadire ve meşiya.

Roja ku bave vvî je re U ser kar peyvî û je re got ku Elîke tebax U berdestekî digeriya, Seydo di cî de nas kir ku evv e dûrî heval û hogiren xwe biketa. Le vvî dile xwe bi tiştêkî xweş kir, vvî bavver kir ku di bine çadire de vvî e zike xwe bida ber xwarin û vexwarinen pir xweş. Sala buhurî, dema evv hena pir 75

zarok bû, carinan evv diçû keleka çadire, ü bal bave xwe rûdinişt. Evv derbas nedibû le ji dûranî didît mevanen xwediye çadire çî xwarinen xweş dbcvvarin. Wilo jî dema bave vvî li ser berdestekî ji bo Elîke nan çedikir axifi, goşte berxan, birinca liblibî, dîlimen pener, çaya pir, av û şeker û hemû xwarin û vexwarinen ku li mala vvan peyda nedibûn di sere vvî de dan dû hev, li ber çaven vvî xuya bûn. Kare vvî e çî buya? Evv e li ber deste Elîko buya û av ji bîra nezîkî benderan her roj ji bo çekirina xwarine û vexwarina karkeran bikişanda. Wî bavver kir ku karkeren "meslehe" e bi çend teneken ave tîhna xwe bişkenînin û evv jî herdem bekar bima. Le di bin asmanekî spî de, li ser axek vvek selek sincirî, havîne îaş mirovan zuha di- kir. Germa xurt evv îaşen vvestiyayî diguvaştin, dax didan û tîren roke xwe seraser berdidan nava reh û damaren xwîne. Karkeran ji ber vve şevvate piştî servise xwe davetin bin siya çadire yan mekînen ravvestiyayî û hema av dixwestin. Tasa ave ji destekî diket destekî din, diket bin simbelen stûr, bi havvara leven qelişî û kezeben peritî dihat.

Seydo ber bi çadire ve çû û ji ber roka xurt vvî bi zore ber xwe didît. Herdu çaven vvî bûbûn vvek du liben nîske û di kor- ten xwe de çûbûn xware. Li ber vvan çavan li ser axa bendere çadira spî dibû mîna leylane geh biçûk dibû, geh mezin dibû, geh nezîk dibû, geh dûr diçû. Evv cara çendan bû vvî av ji bîre kişandibû ûbi kovika mezin berdabû bermîlan? Wî nema dihijmart. Av di ser bermîla davvî re çû û vvî bere xwe da bine çadire û li keleka Elî rûnişt.

Di bine çadire de keldûman bi hers ji dergîrke çaydane çaye derdiket û behna mirovan diçikand. Seydo tasek ava sar bi çemçike ji den berda taseke, pišta xwe da çevvalekî birince

76  
û evv bi ser gevvriya xwe dakir. Wî çaven xwe girtin û da nava karvvana xewnen rojan, xeyalen xweşiyar. Wilo jî vvî bere xwe da kîse şeker û kulmek ji vvî şekire hûr berda tasa xwe. Paşe vvî deste xwe direjî qutiyeke kir, evv vekir û biqasî kevçiyekî biçûk xweya lemûne berda nava ave. Wî bi kevçiyekî li hev xist û li hev xist û dema şeker û xweya lemûne di nav ava zelal de vvinda bû, vvî tasa ave bi ser xwe dakir. Wî xwest di deve xwe de tama şeker û xweya leymûne bidîta. Vvî zimane xwe di ser leven xwe re bir û tene vvî di deve xwe de tama axe dît.

Li derve reza zekaxwazan li heviya hatina Hecî ji şefeqe de direj bûbû. Piraniya vvan revviyan kal bûn, vvan bi desten kor û sevvayan girtibûn û ji deren dûr û nezîk ve peya an U ser pišta ker û bergîlan hatibûn. Sal bi xer dbruya û genime zerbûyî di navçeye de digihaşt newqa mirovan. Mebesta dile vvan gişan çend teneken genim bû. Wan pir hevî dikirin û vve roje deste xwe U ber asmane sincirî vedikirin. Ere, heviya vvan



xurt bû û bavveriya vvan bi xwedane çadire dihat. Wan ji xwe re xweş dikirin û digotin ku evv mirove Xwede dabûye e tiştêk bida vvan, dile vvan neşikenanda. Sal pir bi xer bû û bi ser de jî xwediye terekor û patozan hecî bû, bi deh caran çûbû mala Xwede, deste xwe di ser Kevire Reş re biribû û dema re ketibûye maç kiribû. Di zivistane de baran qut nebûbû û reya di navbera gund û bajaran de hatibû birrîn. Piştî vve barana pir Xwede buharek xweş bi ser navçeye de kiribû û axa ter av se- re gulegeniman ber bi ronahiya salek bi xer ve kiribû. Heviya revviyan mezin bû, le ü ser we axe, di bin vvî asmanî de, piçek baye henik ji bo dermanan jî peyda nedibû. Roka ku gulegenimen tije ji bo gvîzanen makinen zaddirûne û patosan amede dikirin di nîve asmanan de ravvstiyabû û hema

77

pelen şevvatan pel U dû pele bi ser sere vvan kesan dadiweşand û mejiye vvan belav dikir.

Seydo pişta xwe dabû telîsekî, haye vvî nema ji tu tiştî he- bû. Evv di sere xwe de anuha vegeyriyabû nava zaroken gund, li keleka gole bû. Gol li ber vvî fireh bû, evv gölek ji av û şekir bû. Seydo bîst sîh gavî je dûr diket û heta ji vvî dihat bi bazdan ber bi qeraxe ve dihat. Gol jî ber bi vvî ve dihat û sînga xwe ya nüşt bextewerî li ber vvî pelin dikir. Seydo xwe davet nav ave, deste xwe li bine gole dida, bine gole hemû şe- kir bû. Piştî panzdeh bîst gavan, vvî sere xwe derdbdst, li neva- len xwe bi kefxweşî dineri. Hevalen vvî jî bi kef dbcuyan, av û şekir vedbcvvarin, ji xwe re dilîstin. Paşe Seydo dibû firendeyek, başokeyek û di ser gola mezin re difiriya. Bi fire û bi zikekî ter evv gelekî dûr diçû, dûrî çadir û axa sincirî diket.

Seydo germa havîne û teneken ave ji bîr kiribû û dabû dû karvvana xewnen serîn dema evv li ser tevliheviya li derve ji nişke ve bi ser hişe xwe ve hat. Evv ji nav pelen hebirmeşî derket, vejeriya bine çadire. Wî car din U keleka Elîke simbelboq çogen xwe dan erde. Tiştên ku her roj ü ber çaven vvî bûn bin bi hin xuyabûn, ciyen xwe girtin. Çaydane çaye li ser papore dicoşiya û qedehen camtenik di nav ava legana lastîkî de direjkirî bûn. Seydo ji ciye xwe tene sere çend kesan didît le ji denge revvî û zekatxwaran vvî nas kir ku trumbeleke, navgîneke xwe h gund girtibû û belkî jî evv ya Hecî bû.

Dema Hecî di bin çadira xwe de rûdinişt, Seydo nevverîbû behna xwe neberda, nebistanda. Wî dbcvest carinan erd vebûya û vve evv daqurtanda, an bibûya mîna reşike şeve û ji ber çavan vvinda bibûya. Piraniya caran vvî tene dbcvest ji vve dere dûr biçûya, xwe bigihanda hevalen xwe. Bi vvan re vvî dikarîbû

78

hezar tişt bikirana, teketa nav ava gole, biçûya nava rez û bostanan, berîken xwe mişt heshesûk bikirana, daf di nevvala çem de li ber kevvzeran vedana.

Li derve, nîvkenüyoneke evvrek ji töze bi dû xwe ve dikişand û bere xwe dabû çadire. Zekatxwaz car din li tiyen xwe rûniştin ji ber ku her kesî trumbela Hecî nas dikir. Kenüyon ji ser reya axe derket û poze xwe ber bi çadire ve kir. Evv li ber singekî ravvestiya, bi hers di ciye xwe de hejiya, toza spî ji ser cane xwe ye hesinî dawêşand. Ewre töze jî bedeng ji ser re derket, bi ser gund de girt û li ser bendere xwe li zekatxwazan peçand.

Bi şaşika xwe ya kesk û zike xwe ye mezin, şex Hadî daket

û bi lez bere xwe da hundire çadire. Mezin û biçûk ji ber vvî rabûn û ber bi vvî ve çûn û xwestin herin deste vvî. Le agir ji asmanan dibarî û şex bi lez buhurî hundire çadire. Nîvro derbas bûbû û vvî nedbcvvest nimeja vvî ü vvî biçûya. Elîke nanpej ji ciye xwe bi lez rabû û xwe bi ser deste direj kirî de xwar kir. Wî doşekê raxist û se çar balgehên stûr danîn ser. Le şex Hadî guh li doşeke nekir û bi gotina peşî vvî berra nimeje xwest. Wî bbcvve evv li ser kulavekî raxist, bere xwe bi gora Pexember li erda Erebestana siûdî ve kir û bi dengê bilind got "Allahû ekber". Li derveyî çadire rewî bi lez ketin reze, rûyen xwe ber bi roka ji ciye xwe nediliviya vekirin û ye nimeja nîvro kiribû jî evv dubare kir. Bedengiyeke mezin xwe li bendere peçand her cara ku şex di dile xwe de, di ber xwe de xwend. Seydo di hundire çadire de çay di qorzîkeke de amede dikir. Di vve bedengiye de keldûmana bihers ji deve çayden derdiket dikir firefir. Li derve ji nevala ceme li keleka bendere, gundiyan keren xwe giredabûn ta neketana

79

nava genimen hişk û berî ku şex nimeja xwe temam bikira yek ji vvan keran bi direjayî ziriya.

Piştî nimeje, şex xwe U ser doşeke direj kir. Wî tiye xwe xweş kir, anîşken xwe di nermiya balgehan de çikandin. Wî tizbiyek direj ji berîka xwe dendst û di nav tiliyen spî û dagirtî de liben vve bi giranî dane dû hev.

Seydo qedeha çaye U ber şex danî û bi paş ve vegeriya ta li ciye xwe rûrûşt. Şex desmalka xwe di ser eniya xwe re bir, evv çend dilopen xwedane zuha kirin û li Seydo zîvirî taseke av xwest. Baye di bine çadire de ji ber agire ku ji asmanan dibariya,

ji ber papore û keldûmana ava çaye giran bû, bîn li mirovan diçikand. Wilo jî piştî ku şex du se qurt vexwarin û riya xwe şil kir, vî ava mayî bi ser axa ber xwe de kir. Ax tî bû û vve di cî de evv av vexwar te digot evv ji hezaren salan li bendî vve bû. Tîbuna axe pir bala şex kişand û vvek ku dile vî bi vve bişevvitiya, vî tasek din xwest, axa ber xwe av da û bi direjayî le nerî. Paşe berî ku hişe vî biçûya derine din, vî li Seydo û li »1A A A A j Eh nen u got:

- Hûn e bi qedre nave Xwede kin tûnek av li vâ axe bikin.

Ji wexme behna mirovan der nakeve.

Elîko ji ciye xwe pengizî, le hat bîra vî ku evv kare hane ye berdeste vî bû û vvilo jî evv bi ser Seydo de rabû:

- Ere Seydo ma tu hinekî xwe nalivînî axa bine çadire avnadî? Hecîjîwextîbe.

Ji ser doşeke, şex saetek berîkan ji ber sînga xwe dendst, le nerî û di sere xwe de hesabine kirin. Rast bû, Hecî jî e direj nekira. Li gor saete evv li ser re bû û piştî çarîkeke çend deqe kem zede gerek U vve dere buya.

Seydo derket û bere xwe da bermîlen ave. Wî satilek tije

80

kir û vegeriya bine çadire. Di vve navbere de şex tas ji deste vî girt, tizbiya xwe danî ser doşeke û bi xwe axa bine çadire avreşandî kir. Vî bi destekî çaya xwe bi giranî vexwar û bi deste din vî tîhna axe şikenand. Dema dîsa revvî rabûn ser xwe û bang hev kirin, vî li saeta xwe dîsa nerî û tas direjî deste Seydo kir. Axe tera xwe vexwaribû.

Trumbela Hecî keleka kemiyona şex Hadî ravvestiya û Hecî bi lez je peya bû û bi rûyekî tirş li kesen ber deve çadire rez

bûbûn nerî. Evv û şex çûn rûyen hev û be ku vvî li ber xwe binerîya, evv vvek her car bi ser sere Seydo de qîriya:

- Agir ji asmanan dibare. De rabe Seydo hinek av li ve axe bik!

Paşe dema vvî dît ku bine çadire xweş hatibû avdan, vvî gotina xwe guherand:

- Le ne anuha, paşe paşe.

Wî destê xwe danî ser mile şex û got:

- Bubure şexe min ez hinekî dereng hatim. Karekî me li bajar çebû, le tu bi xer hatiya.

Hecî û mehvane xwe peyivîn û piraniya caran di nav xwe de kirin kurtepişt vvek ku tiştine pir giring ji hev re digotin.

Piştî nîv saeteke, Hecî sere xwe di deriyê çadire re dendst û bang barkeşekî kir:

- Heseno, rabe deh cevval genim baveje paşîya kemiyona şex!

Di bin siya terektoke merikekî xwe direj kiribû û li ser dengê Hecî rabû ser xwe. Germe evv geş kiribû û piştî çend kelîkan evv bi ser hişê xwe hat. Paşe şex rabû ser xwe, kare xwe û çûyîne kir. Evv e li vvan hemû gundan bigerîya, zekat bida hev, bereketa Xwede bi ser xwedanen terektoke û patosan de biba-

81

randa. Wî e Quran U ser ruhe bav û kalen vvan bbbcvvenda, ji Xwede bixwesta evv U vvan vvere rehmete, di gunehen vvan bi-buhure. Bi rabûna vvî re, Hecî jî ra bû ser xwe û bi vvî re ta ber kemiyone çû. Li vvir çend gotinen vvan mabûn le ne şex ne Hecî ne xwestin di bin agire vvî asmanî de direj bikirana. Wan e hevudu li bajar bidîtana, ecele tunebû.

Hecî dîsa bi rûyekî tirş derbasî bine çadire bû. Wî çbcarak vexist. Elîko çay U ber danî û sere xwe xist ber xwe. Wî nizanûbû e çawa dest bi axiftine bikira. Her ku Hecî dihat, vvî pirsar tiştên di bin çadire de û li ser erdan dikir û Elîko ta bi derziye ve dikir, agahiye xweş direj dikir, bi lez di ser en ne xweş diçû, te digot vvan zimane vvî dişevvitandin. We roje di deste şefeqe de, hesinekî patoseke ji nav her penc patosen Hecî şikestibû. Şufere vve şandibû dû VVanesyana, hosteye ermeni û bi hev re paşe çûn bajare Qanüşlo û hesinekî nû kiribûn. Di vve roje de, patos nezîkî se çar saetan di nav zadan de be kar mabû.

Elîko gerek ev nûçe bigihanda Hecî le çavva? Bi çi zimanî? Wî ceger nedikir. Dema evv vvilo bedeng ma, Hecî le nerî û tedenrist ku tiştêkî ne xweş qevvinûbû. Di vve navbere de kalek derbasî bine çadire bû. Wî çevvalekî pînekirî avetibû ser mile xwe. Bare salan û nişanen zîvariye xezine kvvîr di rûye vvî de vedabûn. Çaven vvî di korten xwe de çûbûn xware û ji ber ku evv demeke direj di bin roka roje de mabû, ji xwe evv çav bi zore dihatin xuya kirin. Hecî çaya xwe bi behntengiyek diyar vedbcvvar û hema li heviya Elî bû ku vvî ji ber xwe ve dest pe bikira. Elîko zimane xwe di deve xwe de digerrand û ji nişke ve deve vvî geriya. Bi dengekî bi tirs got:

- Hecî bila behna te teng nebe. Her tişt xweş derbas dibe.

82

Tene di deste sibehe de patosek hinekî ravvestiya. Hesinekî vve ez bavver dikim şikestibû. Hoste VVanesyana çû ji Qamişle hesinekî nû xist şûne. Ji bilî ve yeke her tişt U gor dile te derbas dibe.

Elîko piştî van gotinan xwe bi ser hev de guvaşt û simbelen vvî bi ser deve vvî de xwar bûn. Wî Hecî ji mej ve nas kir, diza- nîbû çavva dibû dema agahiyek vvilo di nîve mevvsime geniman de dibihîst. Ye kal beguman guhgiran bû û hena gotinen xwe berdidomandin, ji Xwede dbcvvest ku vvî mala Hecî avatir bikira, male vvî pirtir bikira ta xera vvî bigihaştta her kesî. Hos- te VVanesyanyan ne li vvir bû û Hecî dizanîbû çavva evv li bajar peyda bikira. Wî çaya xwe tamam nekir û bi ser kale li hem- ber xwe de qîriya:

- Tu e bigihejî teneka genime xwe le anuha ne wexte tey e. Wî bi lez bere xwe da trumbela spî. Vvî poze vve ji ser ben- dere dendst, ber bi reya bajar kir û pe li benzine kir. Trumbel ne vvek kevokeke le vvek gulla ji lûla tufenge derkeve evv vvilo ji ser bendere derket. Piştî çend kelîkan evv ji ber çavan ket. Mirove kal ji bine çadire derket, vegeriya nava revviyan, ce- vvale vala li ser axe raxist û li heviya vegera Hecî rûnişt. Evv e bigihaştta tenga xwe, Hecî bi deve xwe ev yek gotibû.

Seydo li ciye xwe dbcvvest bigiriya le hesiren vvî nedihatîn xware, di nava paliken çaven vvî de ase bûbûn. Wî li erda bine çadire dineri û dihat ji qehra nava xwe biteqiya. Dile vvî ji binî ve nema diçû tasek av û şekir û anuha diçû mirine, diçû kûsû- ne. Vvî dbcvvest her kes li dora xwe bikuştta, bi taybetî evv ke- sen evv ava vvî bi zehmetî dikişand bi ser axe de dikirin. Vvî dbcvvest paşe xwe bikuştta ta ji vve jiyana pîs xilas bibûya. Vvî bihîstibû ku dema zarok dimirin evv dibin teyriken buhuştta û

83

ji ber sivikbûna gunehen xwe difirin û kef dikin. Vvî di sere xwe de digot ku ji bilî ketina nav rez û bostanan, ji bilî kuştina

beqan vvî tu guneh nekiribûn. Evv vvilo bû dile xwe bi buhişte xweş dikir dema Elîko bi mile vvî girt û evv hejand:

- Seydo, laye kere, ma deng naye te? Ev cara sisiyan e ez ban te dikim. Rabe firaxan bişo, doşeke baveje ser kulîne, hinek av li bine çadire bike!

Trumbela Hecî û kemiyona şex ji ser bendere rabûbûn û ji ber çavan ketibûn. Li derve, zekatxwazan nedbcvvestin ji ciye xwe biliviyana. Evv li heviya vegera Hecî man. Sal bi xer bû û gulegenimen navçeye digihaştin kemera bejindirejan. Sal pir xweş bû û vvan di dile xwe de, di nav xwe de digotin ku Hecî mirovekî rind û dilovan bû. Vvî e ji bo xera e û bave xwe çend teneken genim bidana. Wan tu çevvalen genim nedbcvvestin, tene du se teneke, du se teneken baş dagirtî dfacvvestin û bavveriya vvan bi Hecî xurt bû. Sal bi xer bû, gelekî bi xer bû.

84

#### TEVGEREKE BERÛMET

R... bi du se hevalan re li keleka cadeya heri mezin ji xwe re digeriya, dema dengekî vvek denge guregura evvran xwe li bajar girt û behna vvî hinekî teng kir. Di destpeka de, deng bbcvve pir qels bû û vvî guh le nekir. Wî ji xwe re got ku buha-  
ra nû hatibû, dikarîbû taven xwe, borancn xwe jî bi xwe re bianina. Baxçeye "Gülistana Canan " xwe di nav rengen corbercor de vezilandibû. Di nav şişen hesinî re surren be henikayî û behna gul û kulîlkan li ser basken xwe dikirin û evv behna xweş li hemû bajar belav dikirin. Hehecîken dûvmeqesî ne ji mej ve ji vvelaten germ hatibûn û U ser rûye asmane şîn xezikine reş û li hevhatî bi lavvendî çedikirin. R... jî ne ji mej ve vvek hehecîkeke vegeriya bû û dbcvest bi malbata xwe



re çend rojen xweş derbas bikirana. VVî sale gişê li Parîse, ser-  
85

bajare Fransaye kar dikir û her buhar evv bi jin û zaroken xwe  
re vedigeriya û dûrê tevliheviya cihana bi xirecir vvî çend rojen  
xweş li şehre zaroktiya xwe derbas dikirin.

Evv we roje derketibû seyrane û nerînen vvî di nava şîşen  
hesinê re dibuhurîn baxçe. Serok ji mej ve dergehen "Gülista-  
na Canan" girtibûn û ji ber vî tiştê jê şeniyen bajar dikarîbûn  
tene ji dûr ve dile xwe bi hatina buhare şad bikirana. R...ere  
hundire baxçe nedidît le dizanîbû evv çavva bû. VVî dikarîbû  
çaven xwe bigirtana û yek bi yek reyen teng bi daran xenülandîbi  
bîra xwe baniya. Dema evv zaro bû û diçû dibistane, riya  
vvî di nav baxçe re dibuhurî. We çaxe, deriyen baxçe ji her ke-  
sî re vekirîbûn, nemaze ji bo xort û keçen dile vvan di hev de  
hebûn. Piştî hatina Serok û şikestina bajar, deriyen baxçe car  
din demeke vekirî man. Le leşkeren biyanê çend guhertin te  
de çekirin. VVan di navbera her çend daran de peykerek ji bo  
seroken xwe danîn. Her deh duvvanzdeh gavan, vvan çend da-  
ren biyokan an gvvîzan ji qurm ve rakirin û di şuna vvan de  
peykerekê Serok mîna dareke hesinê çikandin. VVan Mala  
Ferhenga Gel jê helweşandin û li ser bingehen kevnare qesrek  
pir mezin ji bo Serok ava kirin. Evv qesr vve roja buhare di  
nav daran de carinan jê ji R... re xuya dibû. Di nîve reya ku  
ber bi qesre ve diçû, leşkeren bi rext û tufengen xwekar her-  
dem şîpiya bûn û bi rûyine tal li bajar dinerin lülen çeken xwe  
ber bi sînga rûniştivanan ve dikirin.

Denge weke guregura evvran hema nezîk bû û R... ji ber  
nema karîbû bi xweşî nerînen xwe li ser baxçeye rengareng

bigeranda. Wî xwest bizanîbûya evv deng denge çî bû, le de-  
ma vvî kir ku ji vvan du se hevalan bipirsiya, vvî xwe bi tenha  
sere xwe dît. Heval di nav kolanen bajare kevn de ji ber çavan  
86

ketin te digot qey erd qelişî bû û vve evv daqurtandibûn. R. ji  
vvan behnteng bû ji ber ku bi kemanî vvan dikarîbûn tiştêk je  
re bigotana, agahiyek li ber guhen vvî bbdstana. Mala vvî ji we  
dere ne pir dûr bû û vvî bere xwe daye le ji rûşke ve evv reya  
fireh mişt mirov bû û di rûye vvî de hat girtin. Raperîne, serîhildane  
bi dengekî mîna guregura evvran xwe li tiye Serok  
girtibû. Buhar bû û gel dbcvvest agire roja nû, agire Nevvroze,  
di meydana de di dile bajar de pexista.

Di vve gave de, R... xwest bibûya hehecîkek û bi asmanan  
biketa an jî bibûya reşkekî şeve û di jera zemine de biçûya  
xware û vvinda bibûya. Le evv ne bû hehecîk, ne jî bû reşke  
şeve û vvilo jî beçare di vve navbere de ma. Li aliyekî wî, leş-  
keren biyanî milen xwe didan hev, paşûber diçûn û li aliye  
din, gele bajar ber bi vvî ve dihat, dbcvvest agire cejne, peten  
şevvate bi ber peren asmanan bilind bikirana. Di vve gave de,  
R...tegihaşt ku eğer evv di rûye lehiya şeniyan de ravvestiya,  
evv e h ber lingan av û av biçûya. Ji ber ve yeke, dema pelen  
rike nezîkayî U vvî kirin, vvî xwe avet nav vvan û evv jî ber bi  
avahiya bilind ve çû.

Di nav vvan salen davvîn de, tişt pir tevlihev bûbûn û guher-  
tinen mezin di navçeye de çebûbûn. Haya R... pir ji vvan tiş-  
tan tunebû ji ber vvî guh ü guhertinan nedikir û paşe, evv li  
derveyî vvelet dijiya. Evv li Evvropaye bi cî û vvar bûbû. Vvî ji  
xwe re jineke ji vvelet anîbû, karekî baş bi dest xistibû û dbc-

vvest jiyana xwe giş vvilo be sereş û be teşqele bibuhuranda.

Le vve roje vvî bbcvvesta nexwesta evv ketibû nava bûyeran, geremolen guhertinan. Ji roja roj de, vvî dizanîbû çavva di tengasiyan

de xwe mîna mûkî ji nav hevîr bikişanda, çavva xwc

dûrî tevgeren xeternak bikira, vvî dizanîbû çavva xwe ji belan

87

bikiriya. Wî ev tişt dikirin be ku behna kesekî ji xwe teng biki-

ra an jî ji xwe re dijmin çe bikirana. Wilo jî, tevî ku bûyer tev-

lihev bûbûn û qîrîn ji her dere dipijiqî, R... di vve fırtoneye de

li tiştan car din bi dûrbînê nerî. Vvî xwe di nava pelen serîhildane

de şist kir vvek ku dema evv diket nav ava ceman û rastî

gerînokeke dihat. Evv ber bi meydana mezin ve meşiya û li

çareke geriya.

Meydan gelekî hatibû guhertin. Bi hatina xwe re leşkeren

Serok evv meydan gişt kirin sedar. VVan her kese di rûye vvan

de ravvestiya bi vvan sedaran ve kirin û pir xwîn rijandin. Ke-

sen li ber xwe dabûn, xwestibûn bajar biparezin perçe perçe

bûbûn, hestiyen vvan di zindanen kor de riziya bûn an jî xwe li

çiyayen bilind girtibûn, li heviya rojeke bûn, li bendî guregura

boranen guhertinan bûn. R... li meydana nerî û tevî ku bajar

gişt li hev ketibû, hat bîra vvî ku çavva bere evv tev dar û hişînkahî

bû. Piştî vvan salan darek çi ye le tunebû. Di navenda vve

de, pûtekî Serok pir mezin hebû. Serok herdem bi kincen leşkerî

bi rûyekî tirş û bi pozbilindî li kesen li ber nigen xwe di-

neri û deste xwe ber bi bajar ve dikir.

Di nava serîhildane de kesekî destvala tunebû. Leşkeren

Serok çek di nav malan de nehiştibûn le her yekî rahiştibû tiş-

tekî. Zarokan berîken xwe tije kevir kiribûn û vvan evv peyker

ji xwe re kiribûn nîşan. Di navenda meydana de, li ser payekî ji çimentoya ter hesinî, sere peyker vvek çiyayekî bilind bû û bi ser sere daren bexçeye nezîk diket. Herdem bi cil û bergên leşkeran, vî mirove hesinî kesen li ber nigen xwe pir biçûk di-  
dît û destê xwe herdem ber bi navenda bajarê ve dikir.  
Di vî meydana de gelek kesen bajarê hatibûn bi dar vekirin û ye peşî seroke komare bû. Dîtinê heykele vî Seroke li vî dere hişt ku pelen bîranînan li hev bikevin. Leven birînen kevn ji nû vebûn û xwîn di damaran de betir keliya, bi hers coşiya. Çend mirovan ji kerba nava xwe erîşî paye peyker kirin. Ev hatibûnê agirî Roja Nû di nava bajarê de bilind bikin û vvan ji şevvata nava xwe xwestin peykerê bîcînin. R... pevvîst dît ku evv dîrî vvan sereş û teşqelan bima. Piştî deh rojan evv e li balefira xwe sivvar bibûya û li Parîse car din dest bi kare xwe bikira û zaroken vî jî e biçûna dersxanên xwe. Wî ji xwe re got ku kare vvan şeniyan kare dînan bû ji ber ku vî nikarîbû bavver bikira ku hezeke e bikaribûya evv peykerê ji ciyê vî bilivanda. Paşê vvan dikarîbûnê agirî xwe li dereke din hilor biki-  
rana, ma nedibû illeh li vî meydana buya? Rîqê beguman hez deh qat, sed qat dikirin û ji ber ve yeke ji nişke ve peykerê ji ciyê xwe üviya û bû qirçeqirça hesinên vî. Qelşek direj di stûne çimentoya de vebû. Di vî firtone de, çaven R... li komên nûnerên vvelatan dîr, şandeyên kovarê û rojnamanê û perpirsiyaren televîziyonên biyanî ketin. Wan di goşeyeke de dînerin û bere kamereyên xwe geh ber bi qesre ve dikirin, geh dibirin nava gel. R...xwe vvek evvropayikî didît û di vî coşê de vî dizanîbû ku tiştêk bi vî nedihat. Re hemû hatibûn girtin le evv e bi saya biyaniyanê vvan nûnerên vebûya û vî e

xwe bigihanda male û paşe dûrtir biçûya.

Di vve roja buhare de, pir xwîn rijiya, zarok di bin boten leşkeran de perçiqîn û zike jinan bi singoyen tufengan hatin qelaştin. R... evv yek nedît û ne dbcvvest bidîta. Berî ku leşkeren Serok bi cebincanen mezin bihatana û havvîrdora qesre bigirtana, serbazekî mezin bi kincine xweşik û bi devekî bi ken ber bi vvan ve hat. Wî bi du se çar zimanen avropayî dizanîbû û got ku evv giş bi xer hatibûn, ser seran û ser çavan

89  
hatibûn. Vvî got ku tişt hinekî ji ber hovîtiya şeniyan bajar tevlihev bûbûn û ji ber ve yeke nedibû evv U vve dere bimana. Eger tişteke bi yekîji vvan bihata, tiliya yekîji vvan xwîn bibûya, Serok e pir û ber biketa, kirase xwe ye hesinî biçiranda. Paşe, eger vvan agahî dbcvvestin, rastî li ser revvşa we nave dbcvvestin, ji xwe Serok bbcvve dikarîbû hemû rastî ji vvan re bigota. Piştî vvan gotinan, vvî deste xwe ber bi avahiyeke ve kir û evv gişt vexwandin ser masa Serok.

R... li dû serbaze Serok buhurî eyvvaneke gelekî fireh, eyvvaneke lihevhatî û xweş raxistî. Li bajar nan çî ye bi hesanî peyda nedibû le li ser maseyan mezin xwarin û vexwarin hatibû rezkirin û hemû çeşîten mevveyen xweş li ser vvan hatibûndan. Serok nedbcuya û belkî ji tirsê nava xwe xwe di bine zemine de veşartibû. Di zike eyvvane de mirovekî kin û dagirtî bi dengê bilind peline dbcvvendin. Vvî ji bo her kesî û nemaze ji bo nûner û rojnamevanan biyanî re kar û pekanînen Serok di nav vvan salan de rez dikir. R... hinekî guhdarî kir û paşe vvî çaven xwe li dora xwe gerandin û kesen rûniştî temaşî kir. Tîşt li ber çaven vvî vvek di xewnen pirtirs û savvîr de

xuya bûn. Wî dît ku her kesî sere xwe xistibû ber xwe û vvek devvaren ku eme xwe bbcvvin û kayîna xwe bikin vvan kesan hema gepen xwe dicûtin, bi xemgînî li senî û ferfûren nûşt xwarin dinerin. Kesî guhdarî pekanînen Serok nedikir ji ber ku beguman evv serfiraziyen hane bi hezaren caran hatibûn gîsinkirin û hatibûn ezberkirin. R... di vve gave de bavver kir ku vvan mevanen rûniştî goşte şenîyen bajar dbcvvarin û li ser masan dest, ser û rehnen mirovan direj bûn û di nava dohne xwe de keldûman bi vvan diket. Her ku yekî dirane xwe di goşt de diçikand qajîniyeke kerr li ber guhe R... peyda dibû.

90

Bi vve yeke dile vvî li hev ket û bi lez bere xwe da destşoke. Mirove ku pesne karin û pekanînen Serok dida hena lîsta xwe dbcvvend û ye ku je bavver bikira vve bigota tene rakirina nûriyan ji gören vvan ji Seroke mezin kem ma bû. R... nema guhdarî dikir ji ber ku vvî di vve nave de deriyek dît û nas kir evv ji bo derketine bû. Derî nizim û teng bû û R... piştta xwe xûz kir û derket. Wî bere xwe bi lezek mezin da male. Roja din vvî çenteyân xwe dane hev û zîvirî Evvropaye. Vvi dile xwe helbet bi buhara bajar şad nekir le vvî evv hefteya mayî li ber perave li başûrî Fransaye derbas kir.

R... xwe nas dikir û dizanîbû ku heyvane meraniye di nava vvî de tunebû. Evv nehatibû ser rûye dunyaye ta agire şoreşan pâxista, an evv agir xurtir bikira, an jî guhertine mezin di nava tiştên jiyane de saz bikira. Ere eğer evv li ser düve xwe rûniştta kesî e gazinen pir mezin je nekirana. Le belâ, piştî ku evv zîvirî mala xwe, kare xwe û zaroken vvî car din çûn dibistane, evv bi tevgerekâ rabû. Vvî xwest dûvekî mezin bi dû serîhildane

vekira, le vvî ceger nekir û ji ber ku evv dûrbîn bû, vvî dizanîbû ku belkî rojekê serîhildan biserketa û evv yek di sere vvî de biteqiya. Ji ber ve yeke vvî ne biqencî, ne bi napakî li ser axifî.

Wî got çî ye ne çî ye bîr û ramanân vvî û yân kesân dabûn pâşiya serîhildane di derinan de ji hev dûr diketin. Wî dizanîbû ku evv ne xwedî tu bîr û bavverî bû, lâ evv yek li Evvropaye tiştekî hâşan bû. Wî çend hevalân vvek xwe li dora xwe civandin, bi vvan re ü malan an di çayxanân pir en bajâr de rûnişt. Wî bernameyek ji rexistina xwe re danî û paşa tişte herî giring, vvî gazî çend râxistinân nîvsiyasî, nîvmirovayî kir. Wî xwe gihand partiyân ku çavân xwe ji bo rojân helbijartinan berdidan dengân biyaniyan. Vvî bi çend kesen vvek xwe re belavok dendstin

91

le tu kesî rojeke jî evv belavoken hana nedîtin.

Piştî vâ tevgerâ R... dev ji kare xwe berda. Kara vvî vvek hemû karan bû le vvî nema xwest vvek her kesî bima. Wî reya xwe peyda kir û ciyâ xwe di nava civakek nû de dît. Carekê an du caran jî evv derket ser televîziyonê û tevî ku bi direjayî peyivî kesekî nizanibû ne vvî çî dbcvvest bigota, ne vvî doza çî dikir.

92

ÇEND WENE JI JIYANEKE PÎS

VVeneya peşîn

Sala roka hâna bi giştî ji Rojhilatê derneketibû dema çaven du sê pasebanan li çend pitikên reş ketin. Wan pitikan bala vvan kişandin ji ber ku ji dera evv derdiketin herdem mirin û malvvâranî dihatin. Paseban û dergevan û leşkeren nevvbetdar bang hev kirin, hilkişiyên ser bircen bajâr û bi

bâhtengiye diyar xwe ragirtin. Pitikân reş menzintir bûn,  
pirtir bûn, te digot ji asmanan dibariyan, ji zike zemine derdi-  
ketin. Kesân ser dîvvaran piştî bâhtengiye hars bûn ji ber ku  
vvan nas kirin ku dijminan car din mirina vvan dîvvestin, nebedîkirina  
bajâr dîsa ji xwe re kiribûn daxwazî û armanc. De-  
ma roka wâ roja buhara ket zike asman, leşkerân dijnûn ji ser  
dîvvaran kelehe hatin xuyakirin. Wan mîna merşekî reş, mîna  
93

şevê be serî û bâ binî xwe li kelehâ girtibûn. Di dana evarâ  
de, sivvaren li ser piştî hesp û fil û devan peya bûn. Bergîl û  
keren vvan bi zehmetiyek mezin di bin cebincanên şûr û rîman  
de dilivîyan. Al û beyreqân reş U ber dîvvaran kelehâ li hev  
ketin û bû şerqêşerqa vvan li ber baya hovîtiyâ.

Di hundire kelehâ de saniyen bajâr xwe ji destpâka rojâ de  
bi lez û bez amede dikirin. Wan şûr û xencerân xwe tûj diki-  
rin û li gor haza zendan tîr û kevanân xwe di nav xwe de bi  
hev re diguherandin. Di bin tîrân roka rojâ de şewqa çekân  
hesinî en nû hatibûn tûjkirin U bin guhân dîvvaran bilind di-  
ket, vedigeriya û çaven mirovan kor dikir, avvir dibirrî. Şârûyan,  
rûneştivanen bajâr xwe ji bo şerekî dijvvar û bâguman  
direj amede dikirin. Leşkeren vvî dijminî bi hovîtiyâ xwe di  
hemû dunyaye de bi navûdeng bûn. Dengbâjan di stiran û çîrokân  
xwe de herdem bi napakî, bi xerabî U ser vvan diaxiftin  
û digotin ku axa evv leşkeren mîna evvrân kulliyên di ser re dimeşiya  
tucarî nema giha lâ şîn dihat. Wî dijminî vvâ rojâ bîra  
rijandina xwîne kiribû, dîvvest dînya bi tevayiya xwe bikira  
qurtek av, gepek nan, vvâran bikira.

Remo jî vvek her kesî çû û hat, geh hilkişiya ser dîvvaran û



li hazân reş nerî, geh daket û ji ber dergehekâ çû ber dergeheke din. Di dana âvarâ de, vvî berâ xwe da mala û xwest xwe veşarta, cana xwe ji mirinek ne pir dûr biparasta. Dema evv derbasî hundire male bû, destâ kevaniya vvî Güle di nav teştâ hevîr de bû. Gulâ sera xwe bilind kir, lâ nârî û bi vvî re bişirî. Paşe vve hinek av li hevîrâ xwe kir û car din hemû giraniya xwe berda ser teştâ. Erâ, bajar e li ber xwe bida, tişte jâ bihata û nehata â bikira, evv â di rûyâ dijmin de ravvestiya. Parastina kelehâ ne tenâ kara meran bû. Jinan jî radihiştin çekan an

94  
nan û xwarina cengavveran amede dikirin, hîzarân kevn perçe perçe dikirin, ji bo girâdan û dermankirina dev û leven birînan av dikelandin. Gulâ ne ji mâj ve bûbû kevaniya mala Remo û evv cara yekem bû ku vve di mala mâre xwe de ji bo şer hevîr dikir û kara xwe û çend tenûren nanî dikir.

Hevva di hundire mala de giran bû, nediliviya. Xwedanek sar û demûşî ji eniya Remo dihat xwarâ û bîna vvî hema diçikiya. Wâ roje evv ji desthilanîn ketibû û vvî dixwest xwe li paş kulîna an li devereke din veşarta. Di hundire mala de evv çû û hat û bânhtengiya vvî hema zade bû. Leşkeren dijnün di deste sibeha roja din de â beguman erişen xwe bi mendenîqan dest pâ bikirana, paşa â bi beştân mezin gurmînîji dîvvar û deriyen bajar bianîna. Wan â reyek peyda bikirana, vvan e bajar texistana bin destan xwe, mal talan bikirana, bi zora bi jinan bikirana. Remo di hundir de çû û hat û pişti çend kelîkan nas kir ku debara vvî di mala de nedibû û gerek bû li çarak din bigeriya. Vvî li Gulâ nârî û tenâ wâ gavâ piştâ vvâ ya pehn û paşiya vve ya dagirtî ji vvî re hat xuyakirin. Gulâ pâşmalka xwe li nava

xwe ya zirav girâdabû û bi hars hemû girarüya laşe xwe ye lihevhatî berdida ser destan xwe. Haya vvâ ji tişteki nebû û we hevîrê xwe distra. Remo li paşiya giran ya bi strandina hevîr hema diliviya nerî û ta di vvâ dema dijvvar de dile vvî bibijya vvâ. Wî xwest destê vvâ ji nav hevîr dendsta û bere we bida nava ciyan an jî hema di vvâ nave de evv zeft bikira û xwe berda nava hatân stûr. Lâ vvî ji xwe re got ku wext be hawe zû derbas dibû û gav ne gava vvâ yekê bû. Wî gerek reya xwe peyda bikira û deqe berî deqê zû dûr biketa. Di vvâ gavê de Gulê serraxwe rakir û car din bi ken li mârê xwe nârî. Wê dît ku rûye vvî mîna quşûfê zer bûbû lâ rûyê hemû mirovan di demên

95

çenge de tîn guhertin. We bavver kir ku Remo tişteki li mala ji bîr kiribû, vegeyabû û paşa evv ê car din tev li hazân li ser dîvvaran bibûya. Wê vvilo bavver kir lâ vvê roje Remo tu tişteki ji bîr nekiribû. Wî kevaniya xwe ya civvan, mala xwe, namusa xwe, bajare xwe li dû xwe ve ji bona parastina cana xwe ji neyaran re hişt. Dijnûn dizanîbû ku li her bajare dixist bin destê xwe, hemû şaniyân vvî ne qehreman û diler bûn. Wî bîra kesen vvek Remo dibir û ji qazî ve dora hemû bajâr tucarî nedigirt, reya reve vekirî dihişt û bara xwe bi vvî avvayî sivik dikir. Remo jî vvek gelek kesên din reya xwe nas kir û bere xwe da bakurî bajâr. Evv di qulekê di bina dîvvar de derket. Wî gavên mezin avâtin û ji binî ve U paş xwe nezîvirî û berê xwe da daristanê. Di dana evarê de, berî ku rojek bi gihiştî biçûya ava, dergevanek li ser dîvvarê bakur çav û vvî ket. Remo li ber çaven vvî biçûk bû, bû vvek pitikekê û di nava daristanê reş de vvinde bû, ji ber çavan ket.

Li ser dîvvaran, di nav kolanân bajâr de, rûniştevan mîna  
ava li ser agirekî xurt dicoşîyan. Wan bi dengekî bilind hema  
nav di hev de didan, bang hev dikirin, salbcdanân mâraniyân  
çend şerân bere didan. Şirqeşirqa çekân vvan dîvvaran kelehâ  
dihejand û U hemû taran bajâr belav dibû. Li bendî roja din  
kem çav ketin ser hev û xewê ji vve dere bar kir. Zarokên di  
dergûşan de an U ser sîngân diyân xwe kirin carecar lâ kesekî  
nikarîbû evv haş bikirana. Di spîdeya roja din de dijminan â  
erîşen xwe berdana û mirina â tapana xwe texista deste xwe û  
laş li ser rûyâ erdâ direj bikirana. Cengavveran â li ber xwe bidana  
û xwîna xwe ji bo parastina bajare kevn birijandana. Be-  
rî destpâka cenge, evv çûn rûyân hev, diyân vvan seran vvan  
ber bi sîngân xwe ve kişandin û şîrâ xwe li vvan helal kirin.

96

Bav çûn rûyân zaroken xwe û bi xemgînî li jinân xwe nârîn.  
Mirina h hâviya destâ roje tapana xwe tûj kir. Wê aleya  
xwînxwariyâ vvek cavvekî reş û fireh vekir û dara vvê di sînga  
navçeye de çikand.

Paşa gelek xwîn rijîya û gelek hâvî û bavverî di pâcekân  
xwe de qurmiçîn. Destpâka buhara bû û gelek gul li ser daran  
xwe hişk bûn bî ku wexte kesekî hebûya evv bîhn bikirana, an  
diyarî kesekî bikirana.

Weneya duyem

Dema Remo vegeriya, nezîkî salekê di vvê navberê re der-  
bas bûbû. Leşkeren dijnûn ere keleh xistibûn bin destan xwe  
lâ bele roj bi roj zora vvan diçû û agirê şer herdem gûr û  
dijvvar bû. Tâkoşeran ârişân xwe ji hundir û ji dervê pir diki-  
rin û hin bi hin bencvvedanê reya xwe didît û bi ser diket. Mi-

rin û şîniyâ konek bi hev re di navçeyâ de vegirtibûn û cih ne di goristanân kevn de ne di yân nû de mabû. Erteşa biyanî dizanîbû ku şikestin û derketina vvâ nâzîk bûbû û vvâ nema miyên xwe binax dikirin û hema evv dişevvitandin. Ji ber laşân kiziri, bâhna genî ji ser bajâr ranedibû û balendeyân beratan li ser dîvvaran li dora bajâr xwe datanîn û baskân xwe ân vvek depân deriyan fireh vedikirin, ji xwarina goştâ pir bûbûn vvek dermalan û bi zora difiriyan.

Remo ne cengavverek bû vegeriya bû le reya vegeerâ li ber her kesî vebûbû. Paşe vvî dizanîbû ku tirsek vvilo mezin li ser jiyana vvî tunebû. Di dana âvareke de evv nezîkî dîvvaran nîvketî bû. Dema rok li pist asoyâ sor vvinda bû, heyvek pîsik se-  
ra xwe bilind kir û berâ xwe ber bi sînga asmanekî çikî sayî ve  
97

kir. Tarîtiyâ hâna perda xwe bi ser bajâr de nekiribû, le hin bi hin ciyâ xwe çedikir û şuna ronahî û germa roje digirt. Remo derbasî nava bajare vvâranbûyî bû, xwe li pist dîvvarekî veşart û guhân xwe mîna roviyekî miç kir. Di nava vvan mehan de pir tişt hatibûn guhertin. Sînorân di navbera jinâ û mirine de mîna pelân pîvaze pir tenik bûbûn. Piraniya avahiyan hatibûn xwarâ û kâm kerpîç ü ser hev mabûn. Remo li bajâr guhdarî kir û denge vvan leşkeran gihaşt guhân vvî. Evv diçûn û dihatin, bi zimane xwe dipeyivîn û dengâ botân vvan ân giran di nav tamarân mezin ân bajâr de her gav dikirin qurpequrp. Remo xwe ji dîvvarekî avet ber dîvvarekî, ji quleke ket qulek din ta ket tara. Evv nezîkî mala bû û xwe di ser dîvvarâ hevşâ re avât. Ji ber ku hemû çirân mala pâketîbûn û dengî-  
ne dihatin, vvî berâ xwe seraser da axurâ çâlekâ. Wîji xwe nepirsî

çavva di vvan rojân dijvvar de, di vvâ firtoneyâ de mirovan dikarîbûn ji malen xwe derketana û bihatana serlâdana vvan. Dilâ vvî di nav parsûyân sînge de lada û xwâdana sar û demûşî carek din ji eniya vvî hat xwarâ. Evv bi mehan dûrî mala ma- bû û anuha jî dikarîbû di vvî axurî de demekâ xwe ragirta. Wî li dora xwe mâze kir û nizanîbû çeleka vvan bi kudere çûbû. Kesekî di vvî serî de çeleka xwe nedibir garanâ û çeleka vvan gerek li ciye xwe buya di vvî axurî de buya. Wîji xwe re got ku mal û nemaze di demen şer de bâ şîr û bâ mast nedibû. Wî xwest ji Gulâ paşa bipirsiya ka çi bi sera vvâ çeleka hatibû. Di qelşen derî re vvî li xaniyâ mala nerî û li hâviyâ ma ku mâhvanân vvan biçûna û Gulâ çira vemiranda.

Di axurâ çâlekâ de hinekî behna vvî hate ber vvî. Paşa hat bîra vvî ku dema vvî berâ xwe da tara xwe, tişteki bala vvî kişandibû û anuha dikarîbû lâ vegeriya. Erâ vvî dît ku piraniya

98

xaniyan ketibûn, an bâxwedî mabûn, tenâ mala vvî vvek xwe ma bû û dengâ kesan bilind jâ dihat. Piştî vvan mehân pir, te digot vvâ mala nizanîbû şer heye an tune ye û dengâ sıran û mûzîkâ qube jâ dihat. Remo kir nekir bersiva vvâ yekâ nedît. Wîji xwe re got ku piştî rabûna mâvanan vvî â ji kevaniya xwe bipirsiya.

Piştî demekâ, hâna evv di vvî axurî de bû, çend leşkeran beren xwe dan mala û bâ ku li derî xistana, hema derbas bûn. Remo di cî de bavver kir ku evv hatibûn li vvî digeriyan û vvilo jî bêtir di ciyâ xwe de lerizî, xwâdana vvî bêtir bi ser cana vvî de herikî. Wan çend leşkeran demeke baş dirâj di hundir de man û dema derketin tişteki ku ji bâhtengiyâ an ji dijminatiyâ

li ser rûyân vvan xuya buya tunebû. Evv bi ser de jî bi kef  
dbcuyan û di nav xwe de dikenyan û henekân xwe bi xwe diki-  
rin. Evv hemû serbaz dbcuyan û ji stârikân li ser milen vvan û  
nişanen li ser sîngân evv beguman serbazine mezin jî bûn. Li  
ber deve deriyâ hevşâ berdestân vvan sera hespân vvan direjî  
destan vvan kirin û evv jî buhurîn hundire mala  
Paşa, teka teka an her du sâ leşker bi hev re ta derengî şevâ  
evv derbasî mala bûn. Remo di axurâ çâlekâ de dikir îskeîsk  
û vvek pelâ darekâ li ber bayekî dîn û har dilerizî. Wî lîva  
xwe ya jârîn gez dikir û anuha tak xwînâ tev li hâsirân vvî bû-  
bû.

Piştî nîvâ şeve, leşkeran davvî derketin. Evv bâguman mest  
û sencvveş bûn ji ber ku berî ji hevşâ mala derketana, vvan bi  
destan hev girtin û demeke dirâj ji xwe re dîlan kirin. Wan bi  
henekî şûr û rimân xwe carinan jî ber bi xwe ve dikirin û xwe  
li ser axâ dirâj dikirin. Mîze da ser yekî ji vvan û vvî bere xwe  
da axurâ çâlekâ. Wî davva xwe bilind kir û bi ser dîvvar de mîz  
99

kir. Teşkân mîze belav bûn û hin ji vvan jî ü Remo ketin.  
Piştî çûyîna hemû leşkeran Gulâ derket ber deve derî, li  
havrîdora xanî nârî û ket hundir. Wâ çira heyvvanâ vemirand  
û tene ronahî di oda razanâ de hişt. Evv beguman pir vvestiya  
bû û vvâ zû çira oda razanâ jî vemirand. Bi vvâ yekâ, tariye  
xwe li tara gişî peçand.

Remo ji ciyâ xwe liviya, deva deriyâ axurâ çâlekâ bi dizî  
vekir. Evv dudilî bû. Wî ji aliyekî dbcvest berâ xwe car din bi-  
da dîvvarâ bakur, dûr biketa, her tişt ji bîr bikira, ji binî ve  
nema bizîviriya vvâ mala. Ji aliyekî din, dilekî vvî û vege-  
râ he-

bû û dbcvvest li halê Gulê bipirsiya, kevaniya xwe car din bidîta. Wî pişta xwe xwar kir û ber bi pencerê ve çû. Wî destê xwe du sê caran bi hêdika li cama da. Gulê hêna ranezabû û bavver kir ku ev zibûnek, kerîdarekî şermoke bû û piştî çûyî- na her kesî dbcvvest ev bidîta. Wê vvilo jî bi zimane biyaniyan bi dengekî bilind got:

- Îşev tev bû! Sibe dana âvarê vegere. Ez nema dikarim û gerek ez hinekî ji xwe re razâm.

Remo bi tirs li dora xwe nêrî û dile vvî ket cî dema ev çav li tu kesî neket. Wî deva xwe xist qelşa textê pencerê û bi dengekî melûlî got:

- Gulê! Ez im Remo. Mêre te.

Deng ji hundir nehat û Gulê zû bi zû destê xwe dirêjî lempê nekir. Remo bi ser tirsê xwe de bêteng jî bû ji ber ku Gulê bi lez derî venedikir û ne dîr bû ku leşkerekî sencvêş hustuvvê xwe di ser vvî dîvvarê nizim re dirêj bikira û çav li vvî biketa. Erê dînya şev bû lê ronahiya heyvek qels û pîsik dîsa xwe li ser rûyê bajare vvêranbûyî radbdst, siyan tiştan li ser rûyê ârdê dirêj dikir. Remo guhê xwe ji ser textê pencere ra-  
100

nekir û nizanîbû Gulê li hêviya çî bû, cîma vvê derijê re venedikir. Piştî, dengek gihaşt guhên vvî û vvî naskir ku kevaniya vvî bi dengekî nizim di ber xwe de digiriya. Ronahiya çîrê di hundire oda razanê de belav bû û ber bi eyvvanê ve çû. Dema Gulê derî vekir vvê hêsiyanê xwe zuha dikirin. Remo bi lez xwe avet hundirê mala û derî li dû xwe girt. Behna vvî hedî hedî hate ber. Wî dest pe kir li ber ronahiya çîrayê û havvîrdora xwe nêrî û dît ku pir tişt di mala vvî de hatibûn guhertin. Nerî-

nen vvî li pir tiştan nû ketin. Berâ di hevvyane de dîvvançe tunebûn  
û evv masa bi guldankâ tişteki nû bû. Evv buhurî oda  
razanâ û dît ku tişteki vvek xwe nemabû. Bere Gulâ her şev nivîn  
radbrîstin û di destâ sibehâ de evv car din datanîn ser kulînâ  
û anuha textekî ji hesin bêtirî nivâ odâ girtibû. Li ber sera  
text maseyeke biçûk hebû û li ser vvâ râ û revvanî nema bû ji  
ber şûşan bâhnâ û qutiyen dermanan ji bo xwe xweşik kirine.  
Gulâ li bândî Remo bû tişteki bigota lâ Remo bîdeng ma û  
piştî ku çavân vvî li vvan guhertinan di mala de ketin vvî sere  
xwe xist ber xwe. Wî tenâ dizanîbû ku dijnûn dişikest û imka-  
na vegera bi ghiştî li ber vvî peyda bûbû. Evv vegeriya bû ji  
ber ku dîcvest bizanîba çî bi mala vvî hatibû.

Di vve navâ de hâsirân vvî dîsa hatin xwarâ û girî zora vvî  
bir. Wî beguman ji Gulâ hez dikir û çavva buya, vvî evv xwestibû,  
qelenâ vvâ dabû, evv kiribû kevaniya xwe, stûne mala û  
belkî vvî hâvî dikir rojekâ ji rojan evv bibûya diya zarokan vvî.  
Wî nizanîbû çî bikira û hema xwe avât Gulâ û evv ber bi sînga  
xwe anî. Vvî Gulâ hembâz kir û xwest di vvâ gavâ de evv di dile  
xwe de veşarta. Gulâ nema haviya tu tiştî dikir lâ vvâ got ku  
mâre vvâ çavva buya vegeriya bû û vvî â tişteki bikira evv ji vvâ  
revvşa xerab dendsta û vvâ xwe di nav destâ vvî de şist kir.

101

Nâzîkî salekâ derbas bûbû û Remo tucarî laşekî vvilo germ,  
vvilo nerm û nazik û ser sînga xwe nedîtibû. Wî xwe şaşomaşo  
kir nema xwe girt û destâ xwe avet sînga kevaniya xwe. Wî pif  
çirayâ kir û Gulâ avât ser textâ razanâ. Di şevreşâ de vvî kirasâ  
Gulâ di ser sera vvâ re avât û dema vvî destâ xwe dirîjî doxîna  
derling kir, evv ecâbmayî ma ji ber ku evv cara yekem bû ku





ket. Di hevşşa mala de vvî bi tirs li dora xwe mâze kir û bayekî sar mîna şivekâ li rûyâ vvî xist. Gulâ derket ber deva deri. Wâ di tariyâ de mârâ xwe nedidît, le dizanîbû ku hâna evv dûr neketibû.

Bi dengekî bilind û ta ji vvâ hat, vvâ kir qîrîn:

- Ma tu ji çi ditirsî Remo? Eğer leşker te bigirin, ji vvan re baje tu mârâ min î. Evv â te nas bikin û vvâ te berdin. Ma te çi ji vvan kiriye ta evv te bigirin?

Remo xweş dengâ vvâ kir û nava vvî qetiya. Li ser vvâ qîrinâ belkî leşkeran dora xanî bigirtana û ji ber vâ yekâ vvî bêtir lezand. Lâ evv bextewer bû û kesek ji vvan li vvâ dere nebû. Evv ji bajâr dûr ket, vvî berâ xwe da daristanâ û paşa durtir çû. Gulâ derî girt, xwe avât ser ciyan û bû kûrekûra vvâ. Hâsi-rân vvâ vvek her roj hatine xwarâ û vvan rûhinarik û çavân vvâ şevvitandin.

103

### SERİYE KU HERDEM JI BÎR DİKİR

Dema min dest bi bazdanâ, ez dbcvvzim bibâjim bi reva kir, min yekcar nizanîbû ku ez â vvilo dûrî male, dûrî niştimane vvâranbûyî biçûma. Xwâdan ji hemû bedena nûn dihat xwarâ û ya eniya min di nav ebru û mijankan re diket nav çavân min û evv dişevvitandin. Dile min di sînga min de bi hars lâdida û dikir ku belav bibûya. Ez vvâ cara ji ber kê direviam? Ezji çi ditirsiyam? Bersiva van herdu pirsan pir hâşan e: ez ji ber her tiştî direviam û hemû havvîrdora min bûbû mirin û tirsane nebedftbûnâ berdida nava min. Berî Helebçeyâ agir, piştî Helebçeyâ jî agir û di hemû dîroka Helebçeyâ de agir. Helebçe, helkehelk, helak, hevvar, helweşandin. Helebçe herdem di dile ba û borana de. Helebçe herdem di bin bara-

na mirin û malvveranî û taven xerdelâ de.

104

Xwendevanê hâja, guhdarê biraz! Min ji bîr kir U gor usûlâ ez xwe bi vve bidim naskirin. Nabe ez sera vve hema vvilo bâşînim bâyî ku hûn bizanibim bi kemanî ez kî me. Ez hâvîdar im ku hûn â di vâ kâmasiyâ de bibuhurin. Hişâ nûn yekcar nemaye û ez her tiştî ji bîr dikim. Sera min bi rastî vvek moxilâ, na vvek bâjingâ, na vvek serada ye, seradeke bi qulân pir mezin e. Eşa nûn, dostân pir hâja, evv e ku ez bâhiş im. Ji bîra min diçe çavva kêr ji destpâka dîrokâ de û ji roja roj de li ser qirika min hema pir dibin, çavva her kes mirina min dbcvvaze. Di reva xwe de min pişta xwe dabû vvelatâ xwe, erâ min pişta xwe dabû niştimanâ derd û kulan bâserî û bâbinî. Min berâ xwe dabû bajarân sergûne, tbcûben guhartinan, demân nû. Mîna hemû sâvvî û sehân berderiyân dîrokâ, min dbcvvest pişta xwe bidaya dîvwarekî neketî. Li ser râ, di nava neval û çiyân de, nîşanine grover, sâniçik, çarqorzî hebûn û Xwedâ giravî çî ye ne çî ye vvan bere nûn ber bi xelasâ, ber bi jiyân û azadiye dikirin. Wan nîşanan nûn sipartin hev û çiyayekî nûn xist bextâ çiyayekî din û ez vvilo demeke dirâj li ser vvan reyan mam ta ku davvî ez rastî bajarekî mezin hatim. Bi tirs min li paş xwe nârî û dema min nema pâjna leşkeran pir, kesân di mirovan de hildidan û sehan kir, min xwe berda erda rast. Dilâ min fireh bû û min ji hemû cane xwe xwest bavver bikira ku ez bi rastî gihaştibûm bendera xelasâ, warâ jiyana. Min ji binî ve nikarîbû bavver bikira ku li ber dergehekâ ji dergehan vvî bajare hana pir tişt â bi sere min bihatana. Li gor nîşanan, xwendevanê hâja an guhdarê biraz, ez ji nav pencân mirine

filitîbûm, ez dûrî evvrân xerdelâ û bâhna mirine ketibûm. Û vvek lavvikâ navpâçekâ ku deva xwe ber bi pâsîrân grover û mişt şîr ve dike, min jî Xwede giravî bere xwe ber bi çavka-  
105

niyân xweşiyân dikir, dev ji kul û derdân xwe berdida û dest bi jiyanek bâsereş dikir.

Ez bbcvve mîna hemû hemvvelatîyân xwe di nav tirs û savvâran de mezin bûbûm. Bi hezarân caran ez û mirina em rastî hev hatibûn û vvâ tapana xwe dirâjî nigân min kiribû. Wâ bi min dilîst vvek çavva pisîk bi nûşkâ bâcare re ji xwe re dilîze. Ji ber vâ yekâ ez herdem bi tirs bûm, le belâ vvan nîşanan niştin ez ji ber tirs nava xwe şerm bikini. Ez car din li hâviya şevâ mam û vvâ jî vvilo dest pâ kir perda xwe bi ser rûyâ bajâr de kir. Lempân malan jî dest pâ kirin piştî yân cade û kolanan pâ ketin. Li gor bîdengiya ku xwe li havvîrdora min girtibû, gerek bû min bidaya ser râ, berâ xwe bidaya dergehane bajâr. Ez bbcvve gihaştibûm vvelate kelehân kevnare, cihana xwarin û vexwarina xweş, bâhnân giranbûha, ez ketibûm navenda jiyanâna hâşan û bâ serâş bûbûm.

Lempeyân bajer di tariya şevâ de xweş xuya kirin. Û şevâ hin bi hin perdeya hâminî û bedengiye li ser rûyâ cihana raxist. Wilo jî, min destâ xwe di ser sera xwe re bir, porâ xwe rast kir û bi tiliyen xwe şeh kir. Riya min dirâj bûbû û di dile xwe de min ji xwe re xweş kir û got: "Hema ez bigihâjim bajâr, ez â tâkevîm nav ava germ, sera xwe baş bişom, riya xwe kurt bikim û bi kemanî duvvanzdeh saetan ser hev ez â ji xwe re razâm, çavân xwe nerm bikim.". Gihayâ dirâj di vvâ navberâ de di bin payân min de dikir xişexiş û behna jiyana ji her

derâ dipijiqî û bâvila nûn dax dida. Di vvâ navâ de dengâ teqînekâ  
gihaşt guhâ min û gulleyekâ ba qelaşt û di sînga min de  
çû xwarâ. Belâ, gulleyek ji lûla tufengekâ derket û di sînga  
nûn de û ne di piştâ de çû xwarâ. Berî ez bi ser dev de biketama,  
gulleyek din berâ xwe ber sînga nûn ve kir û vvâ ciyâ xwe  
106

di navenda dile nûn de vekir.

Piştî van herdu gulleyan tişt pir tevlihev bûn û bûyeran  
vvek libân tizbiyâ dan dû hev. Min bavver fikir, vvek min berâ  
got û nivîsand ku ez gelekî dûrî pencân mirine û evrân xerdela  
mirovkuj ketibûm. Ez gerek ketibûma nava serdemân  
ûmîdiyâ, demân bavveriyâ û min ji xwe re got ku evv herdu  
gulleyan ku aramiyâ vvâ derâ ji hev xistin tiştine ne di ciyân  
xwe de bûn.

Wilo jî ez tâghiştîm ku ez carek din hatibûm xapandin.

Erâ, gazinan ji min nekin, xwendevanâ delal, guhdarâ hâja!  
Ez herdem ji bîr dikim ku ez tâm xapandin. Ez bâhiş im, zû  
tiştan ji bîr dikim. Sera min vvek bâjingâ ye ava bûyer û biserhatinân  
mezin ân kal û bavan tâ de namînin.

Leyse... tişte çû nede dû! Ez ketibûm ketibûm. Lâ belâ tevî  
ku ez di nav xwîna xwe de gevizîm, min nizanîbû aş çi ye. Ez li  
ser axa rast direj bûm û nûn ji xwe re got ku Xwedâ kir ku  
gulleya peşî di movikek piştâ nûn de çûbû xwarâ. Eger ne ji  
vvâ yekâ buya, vvâ bibûya barebara min li ber dergeha vvî bajarî  
û belkî jî min hin ji şanî û rûniştivanân vvî bâhteng bikira-  
na. Gulleya pâşî vvek derziyek bencâ hemû cana min tevizand  
û pûç kir. Wâ gulleya davviyek ji hemû aş û şevvatân kevn re jî  
danî. Ez nizanim çiqas wext di wâ navberâ re derbas bû, çend

saet, an çend roj, belkî jî çend sal û sedsal buhurîn. Lâ xwendevano, guhdaro, eğer ez ji vve re bâjim min di vvâ revvşa dijvvar de çî xwest hûn â ji min bavver nekin. Hûn â bâguman bibâjin "Qûn tazî û tembûrâ dbcqvazî " Ez e ji vve re bâjim min di vvâ malvvâraniyâ de çî xwest û eğer hûn bbcqvazin bi nûn bikenin hûn bi kefa xwe ne. Erâ, nûn xwest ku ez ne bi ser dev lâ bele bi ser piste biketima. Eğer ez bi ser piste dirâj bibû-

107  
ma, min â vvek di şevân vvelât de, evv şevân berî qirkirina He-  
lebçeyâ, berî bombeyân kîmavvî, nûn â li stârikan di asmana sayî de û li heyvâ bi kafa dilâ xwe binâriya. Ez sivvare âşâ bûm û nûn â bi sera mehîna xeyalâ bigirta û ez â dûr biçûma, an jî min â xwe mîna başoke, mîna heloyâ çiyayân bilind bidîta. Min â ba bi basken xwe U ser ava gol û ceman biqelaşta. Di havînan de, di germa şevân dirâj de, dema ez zaro bûm, xwişka min cihâ min li ser bana xanî di bin asmana nûşt stârikan hûr û mezin de fadbdt. Min xwe li ser nivînan dirâj fikir sera xwe datanî ser herdu destan xwe. Min carinan bi henekî stârik dijimartin, erâ ez dibâjim "bi henekî" ji ber ku li vvelatâ min, Xwedâ jî nikare stârikan bijimâre, an jî dikare lâ naxwaze wextâ xwe bi tişteki vvilô pûç û vala vvinda bike...

Bele, dema ez li ser rûyâ vvâ axâ ketim, min pir dbcqvvest bâhna xwe bi heyvâ fireh bikira. Min dbcqvvest bang vvâ bikira, bigota hey heyva xweşik, û tu jî hey feleka xayîn, hey serdemân kuşdaran, de vverin li halâ min mâze bikin, de vverin li bextâ min yâ reş temaşa bikin. Lâ rûyâ min ketibû nav axâ, nûn ber xwe nedidît û gotinek jî çî ye ji deva nûn derneket. Ez vvilo mam ta ku payine giran di nava gihayâ dirâj de nâ-

zik bûn. Li ber dergeha bajarê azadiyê, penahendiyê, mirovek li ser sera min ravvestiya û min di dilê xwe de got ku hebû nebû evv bû yê lûla tufenga xwe ber bi sînga nûn ve kiribû û vvî min li ser axe vvek termekî rast kiribû. Wî mirovî piştî ku dît deng ji nûn nehat destê xwe avêt milê min û min bi ser piste de qulipand. Xwede kir ku çavên min vekirî mabûn û vvilo jî min li rûyê vvî û li asimanan jî niherî. Xwendevanê min, guhdarê serpêhatiya min, herdem dema mirov û ser mârkuj û kuşdar û xwînrajîan diaxife, evv vvan rûtirş û nexweşik dibine.

108

Evv vvan dbce kirasê lavvirân dirende, vvan dike teba, dâw û şeytanân bin ax û ser ax. Lê kuşdar hemû ne bi vî havvî ne, vverin ji nûn bipirsin ez ê ji vve re bejim evv çavva ne. Piraniya caran gotinen vvan hungiv ji vvan dibare. Evv rû biken in, xwe mehreban û comerd nişan didin. Tişte ez dbcvvazim di derheqa vâ yekê de bibêjim evv e ku evv mirovê U ser sera min ravvestiya ne vvek guran bû û behna xwînxwaran ji vvî nedihat.

Evv bi ser de jî pir lihevhatî, bejinzirav, bedevv bû, û siya xemgîniyekê U ser rûyê vvî eşkere bû. Wî vvek ku dizanîbû nûn ji heyv û stârikan hez dikir û vvî hişt ez texnekê ji xwe re û dora xwe binerim. Dema ez dibêjim û dora xwe, ez dbcvvazim bi-bêjim li asmanan çûnku gihaye dirêj nedihşt nûn tişteki din bidîta û rondikên çaven nûn bi hâsanî nediliviyên. Daxwaziya min jî evv bû û nûn û asmana vvê navçeyê bi kafa dile xwe temaşî kir. Paşa, vvî mirovî çokên xwe dan erdê, destê xwe di ser rûyê min re bir û min di vvan destan de hinek hezkirin dît. Li paş vvan neynikên grover, çavên vvî ên şîr pir xweşik, dilbir bûn û eğer ez jin buma ez ê bîguman dil tîketama vvan. Lê ez

mer bûm, mârekî di nav xwîna xwe de gevizî, li ser axa bajarekî dûr dirâjkirî bûm. Wî mirovî kêrek devtûj ji kemera xwe derxist û evv di ser neynûka xwe re bir û keniya. Wî destê xwe di ser çavân min re birin û evv dane hev û kêr danî ser zengeloka min. Vvî sera min ji gevvdâ nûn jê kir û ez yekcar bi eşê nehisiyam. Du tiştan hislin ku ez yek car neêşim: yek, evv gulla ku di movika piştê nûn de çûbû xwarê laşê nûn pûç kiribû; ya duduyan, destê vvî mirovî sivik bû, bânguman destê hosteyan bû û kêra vvî di qirika nûn de çû xwarê vvek çavva kêrek tûj hermiyeke gihîştî bike du felqe.

Li vvê derê, li vve navberê, laşê nûn yê be serî ji bo gur û  
109

rovî û keftaran ma. Wî mirovî tufenga xwe avêt milê xwe, sera min xist tûrikê xwe û bere xwe da mala.

Mal, ez çî bêjim, ne vvek hemû malan bû. Pirtûk, belgeh û şûşen tenik en xwe vvek maran li hev dipeçandin hundir mişt kiribûn û min nas kir ku mal mala mirovekî pir zana, belkî nijadnasekî navdar bû. Min xwest bi vvî re bipeyivîma çend pirs bikirana, erê çend pirsên giradayî bi revvê me ya kembax û bi vvan balefiren ku mirin li Helebçeyê belav dikirin û gund û bajar qir dikirin. Min xwest li ser Koça Mezin jê û li ser vvan nişanen li ser rê bipeyivîma. Lê vvî zanenasî eşkere li min meze nedikir, paşa, be gevvdê min ê çavva gotinek çiyê bigota? Eşkere bû vvî zaneyî guh li derdê û kulan nûn nedikir û evv bi kare xwe daketibû. Vvî dizanîbû ku pirsên nûn pir bûn lê vvî bere xwe dabû kargeha xwe û haya vvî ji baya felekê tunebû. Wî agir dadabû û bûbû pelqepelqa dermanan di şûşen xwaro maro de. Xwendevanê hêja, guhdarê delal, ji min re nebêjin



cima min nekir gazî, cima ez neqîriyam. Ma mirov dikare bi-  
ke qîrîn an nalîn eğer sera vvî ji gevdâ vvî bâ jâkirin? Ez ji ber  
bombeyen kîmavvî filitibûm û vvilo jî di nava dermanan kîmavvî  
de, por, mijank, ebru, cârmâ rû û goşt bi min ve, bi sera  
min ve neman. Min nema ber xwe dît û di qulân çavân min re  
di firniken bevila nûn re, di guhân nûn re mejiyâ min derket û  
kuloxe sera nûn tije av bû.

Piştî demeke, vvî kesî agir vemirand û ava ku dikir pelqepelq  
hin bi bin sar bû. Vvî lepikex xist destâ xwe û rahişt min.

Wî qafâ sera min, kiloxe spî, danî ser maseyâ. Paşa vvî tiştêkî  
bi rastî nakeve seriyên bi min kir. Wî lempek biçûk xist hund-  
ire min û vvî fîşa vvâ xist qula eletrîkâ. Dema vvî lempe paxist,  
ez bûm vvek Xocâ Xizir û ronahî ji min bariya. Evv ji herdu

110

qulên çavân nûn, herdu guhân nûn, herdu qulân poze min û  
bi taybetî ji deva nûn yâ vekirî derket û di nava pirtûk û belgehan  
de belav bû. Berî vâ yeke, min tücarî bîr nedibir ku vvilqas  
qul di sera min de hebûn. Wî zanenasî bi kefcvveşiyek  
diyar destâ xwe di ser textikâ eniya min re bir û tiliya xwe di  
ser derzan re gerand. Anuha dema dilâ vvî bbcvvaze, evv lempe  
pâ dbce û ronahî ji min dibare û dema naxwaze, ji xwe naxwaze  
û ez tâm ji bîr kirin.

Xwendevano, guhdaro, hûn â bejin serpehatiya nûn nakeve  
seriyên. Lâ cima ez e derevvan U vve bikim? Ê cima ez â  
bextâ xwe reş bikim? Ez rastiya ji vve re dibâjim û hûn bavver  
dikin bavver nakin hûn bi kafa xwe ne. Di destpâkâ de, nûn  
got ku ez â xwe bi vve bidim naskirin û min ji bîr kir. Lâ vvek  
ku hûn xweş dizanin, ez bâhiş im. Sera min bâ mejî ye bâjengek

şikestî ye, evv vala ye û tu tişt xwe te de nagire. Xwe hinekî ragirin ez â ji vve re bibâjim ez kî me, eğer zanâ pir navdar min pâxe û eğer hişâ min bâ sera min. Belâ, dema nûn dest bi bazdanâ, ez dbcvvazim bâjim, bi reva kir, min yek car nizanîbû ku ez â vvilo dûrî niştimanâ xwe biçûma û bitengijiyama. Xwâdan ji hemû cane nûn dihat xwarâ û ya eniya min çavân min dişevvitand. Dilâ nûn di sînga min de bi hars ledida û di-kir belav bîbûya. Koça Mezin dabû ser reya dûrbûnâ û nezîkî sâ melyonan xwe li tbcûban dbdstin, li deriyen jiyane, li pence-ren cîhanâ bi destine vvestiyayî dbdstin. Ez ji ber kê direviyam? Tirs min ji çi bû? Alîkariya min bike, bîne bîra min! Bâje, xwendevanâ hâja, guhdarâ biraz! Bâje!

111

PIRTÛKEN ME YEN KU DERKETINE

- \*A. S. Pûşkîn | KEÇA KAPFTAN | Roman
- \*A. P. Çexov | mirina karmend / Novel
- \* Heseni Meti (nivîsende) / ARDÛ /// çîrokin geliri
- \* RedtvaniAlî | TILÛRE BEGANE / Novel
- \* Heseni Meti | smirnoff / Novel
- \* Musa Anter | HATIRALARIM / Bîranîn
- \* Mehmed Uzun | rojek JI ROJEN

EVDALÉ ZEYNIKE | Roman

- \* M.F. Dostoyevskî | meriven reben / Roman
- \* Mehmed Uzun | MİRÎNA EGÎDEKÎ / Destan
- \* Hesene Mete | labîrenta cinan / Novel

Adresa nû:

WEŞANEN VVELAT

Box:4123

141 04 Huddingel Sweden

WEŞANEN WELAT

Me/lînê bi hêsanî hefiar ji destê wî distand  
û mîna sfêrika kiL /JInjc, wê xwe bi ser  
mîlê asm(Jfiên fireh de .nmr dikir û dûr diçû.  
Ferzend û mehlîe Komtanên bêhejmar li dû  
xwe dilî~1ilî, scrdelllôl malîi'êraîîyan jî hfr  
dikmn, bi hel' re diçlîn warê Jînê, roj Lî şer'ên  
cl'/nê. Fcrznd kanî li demen .\wîll.\waran Lî  
bêhna mirinê li pa~ xwc dilî~t. Di wan şel'ên  
dirêj de, wî qesir di serê xwe de .xweştir dikir,  
fClîgarenK dikir, wek bûkekê di:remilG1ld, hi  
destê wê digirt, dibir bal xwe û ew li kêleka  
xwe, li ser ciyan dirêj dikir. Ew dibû Ferhadê  
evîndar, ji Şîrîna xwe re qesrek berz ji daxwaziyan  
saz dikir, ew dibû Mem Lî bi agirê  
nava .\we şevên hVl'Îtiyê dikirin rojên hêviyê  
Lî govendên rindiyê. Paşê, Ivî xwe /}erdida  
hîndirê wê Û .\we di dalan û eywanên pir de  
bi kêfnveşiya mest û aşiqan winda dikir.

\*\*

SMIRNOFF

Hesenê Metê

SMIRNOFF

Hesenê Metê

WEŞANÊN WELAT

Stockholm 1991

Weşan: 5

SMIRNOFF

Çapa yekem

© Hesênê Metê

Pergela berg û rûpelan: N. Kirîv

Çap: Nya Wiking Tryckeri AB, 1991

ISBN 91-97 12 54-1-5

NAVEROK

Smirnoff 9

Bîranînên Xatûnekê 17

Lêkolîner 24

Nivîskarî 29

Mêrxasî 36

Tizbî . 41

Xwî 46

Zewac 57

Çarşef 59

Kultur 65

Anons 72

Roja Pîrozwer 78

Rabiff 83

Şanoger 89

PÊŞGOTINA WEŞANXANÊ

Her tîpekî merivan bi serê xwe dunyayek e. Bi rengê jiyana xwe, bi xwiyê xwe, bi hiş û aqilê xwe, bi çê û xirabiya xwe ve dunyayek e. Dema ev dunyayên ha bi hunermendî têne vejinandin, meriv baştir têdigêhîje, meriv wan baştir dibîne.

Pirî caran meriv hay ji xwe nabe ku meriv bi xwiyê xwe

valayiyekê h" xwe dide der, çewtiyekê dike, an jî du gotinên meriv hevdu nagirên. Hesenê Metê, ev tişt ji xwe re kiriye prensîb û di vê pirtûka piçûk de çardeh tîpên weha ji kurteçîrokên xwe re kiriye mijar.

Di van kurteçîrokan de alternatîf an jî tîpekî ku meriv bibêje ev maqûl e, tune an jî veşartî ne. Ev valayiyek e ku Hesenê Metê bi zanatî di kurteçîrokên xwe de dihêle. Dihêle ku xwendevan bi xwe bibîne, bi xwe pê bikene û bi xwe li ser bihizire.

Mijar û tîpên ku hatine nîgartin, pirî wan jiyaneke li derveyî welêt e. Li gor vê jiyana derveyî welêt, tîp û mijarên rojane çi xwestiye, Hesenê Metê bi comerdî rê li ber vekiriye, bi zarxweşî û nefspiçûkî gotiye: fermo! Ango ji leheng û mijarên xwe re ne gotiye ev şerm e, ev dûrî aqil û berbora civaka me ye. Leheng, hefsarê bûyera xwe bi kuderê de tewandiye, Hesenê Metê jî daye pey wan.

Pîvana hunermendî, hûnandin, xweşikbûn an jî nebaşbûna van kurteçîrokan, em ji we xwendevanên hêja re dihêlin. Lê gotina me ev bû: Em bextiyar in ku bi çapa vê pirtûkê, me pirtûkek din jî li pirtûkxana kurdî zêde kir.

Weşanên Welat

SMIRNOFF

Gelto îxwediye malê bi rûkenî didomîne û dibê:

- Wek ku min got, Xusrew... ku biqewume, ez ji deh jinên lepdarîn jî jîrtir im. De êdî tu û bextê xwe... de fermo!

Xusrewê ku bi mêvandarî hatiye mala hevalê xwe, bi dilxweşî U xwarinên ser masê dinêre, destên xwe di hev re dide, bi devekî avî li Gelto vedigerîne:

- Bi Xwedê, tu jî ne hindik î! Ca lê binêre... wey, wey wey!..  
dibêje û hinekî din jî xwe ber bi masa xwarinê dike.

Ji bo Xusrew, bi rastî jî tiştêkî seyr e. Lewra masên wusa,  
pirî caran di çîrokan de bi xwarinên weha têne xemilandin. Ji  
xwarinên goştî sê babet, ji şorbên sivik du babet, birincek  
hebhebî û bi mewûjên sor, selete û hêşînayî bi awayekî wusa  
li ber hev hatine danîn ku ji bo hunermendekî herî mezin jî  
ne asan e ku ji bo pêjnên xwe tiştêkî weha bifikire. Du sê  
xwarinên din jî hene ku ew nizane wan bi çi binavîne. Ji bilî  
van jî, ji çend babetan selikek tije fêkî li hêleke din î masê, li  
bendî hevalbendan e. Lê tiştê ku bêtir bala Xusrew dikêşîne  
ev e, hevalê wî dest bi vexwarina meyê jî kiriye. Meyên giran!  
Şûşekek vodka bi du piyalên vala li hêleke masê ye.

Piştî ku Xusrew bi rewşek matmayî çavên xwe li ser hemî  
tiştên ser masê digerîne, ne bi devê xwe lê di dilê xwe de weha  
dibêje: «Xwedê dizane, Gelto bi her awayî hatiye guhertin.  
Ango ne Geltoyê heşt sal berê ye.» Û bi vê guhertina  
hevalê xwe jî gelekî kêfxweş dibe.

Gelto têdigêhîje ku hevalê wî ev rewşa ha ne dipa. Ji bo ku  
tiştêkî nebaş neyête ser hişê hevalê wî, zûzûka vedigere ser û  
dibê:

- Binêre Xusrew, em ê îro li kêfa xwe binêrin... bixwin,  
vexwun û ku te bivê... em hertiştî ji bîra bikin û ji jiyana xwe  
ya mayî, em rojekê jî ji bo xweşiya dilê xwe bibuhurînin. Ya  
sitar, ma kevir ê bibare! Bi vê hevdîtina me ez ewqas kêfxweş  
im ku, Xwedêyo!..

Xusrew di vî kevinehevalê xwe de guhertinekê dibîne, lê bi  
çiqasî û bi çi awayî ye, nizane. Lewra berê, ji bilî çend hişkepeyvên

polîtîk tiştekek ji devê vî hevalê wî dernediket. Û anuha jî li ser vê masa pîrozwer çêlî jîyanê, çêlî kêfxweşiya dilan dike. Lê dîsa jî Xusrew xwe pêve bernade, zêde jî dirêj nake û bi kurtebir dibêje:

- Ma çi pêwîst dikir ku tu ewqas wexta xwe... serê xwe bêşînî. Me ê bi hev re tişteki sivik...

Gelto destê xwe li ba dike, peyva wî dibire û dibê:

- De lê binêre, ha! Wext!.. ma ev ji kîjan wextê de ye ku me hevdu ne dîtiye, malava! Heşt sal kuro, heşt sal! Ne bi gotinan e, ezbenî!.. Bi Xwedê heta mehekê jî ez te bernadim û hew!..

Herdu hevalbend li ber masa xwarinê rûniştine, giran giran dixwin û hêdî hêdî jî dipeyivin. Mijarên galegalên wan ji demên buhurî dest pê dike. Di navbera hevdîtina meriv de çiqas wext derbas bibe, meriv jî ewqas dixwaze li wan kevnerojên buhurî vegere. Loma ev herdu hevalbendên kevn jî bi galegalên xwe diçin demên xwe yên buhurî û li wir dijîn.

Li ser rojên buhurî, li ser pêwendiyên rojên kevn, li ser he-

10  
şaşiyên berê tê peyivîn û dûre peyv tê li ser polîtîkaya rojên kevn disekine. Di vê navberê de mîna ku tiştekek keti be bîra Xusrew, vedigere ser Gelto û dibê:

- Ero, min bihîst ku... Xwedêyo, ev çi rewşa me ye! Em hemî derbeder bûne! Min bihîst ku Mervano jî li van derina ye. Ma tu tew wî nabînî, çawa ye?..

Bi bihîstina navê Mervano, mîna ku Gelto hinekî veniciqe, li şûşa vodkayê dinêre û dûre bersiva hevalê xwe dide:

- Na... Berê, me heroj hevdu didît. Em di dersxanekê de li

kêleka hev rûdiniştin. Lê dûre dilê me ji hev ma û min xwe jê dîrxist.

Mîna ku Xusrew ji pirsaxwe poşman bû be, hinekî jî xemgîn dibe û dibê:

- Heyf e bi rastî. Çima?.. Mervano xortekî baş bû.

Gelto bi enirîh û bi hêrsbûyîneke şêrîn dibêje:

- De başbûna wî serê wî bixwe, lo! Meriv weke wî xwe ewqasî jî wenda nake! Başbûna çi?.. De tu guhdar bike ez ji te re kat bikim: Ez û wî, em bi hev re di dersxaneke zimanê swêdî de bûn. Di dersxanê de, ji çend welatan biyanî hebûn. Ji wan yek jî keçeke polonî bû. Ku te li keçikê binêriya, te ê bigota ev keçika ha, rasterast ji kerxanê reviyaye. Nexweş! Heroj bi mistek boyax dihat dersxanê. Dema ku mamoste dixwest em herkes bi kurtî li ser welatê xwe bipeyivin, ew jî radibû, ji bo pîskirina sîstema sosyalîst çi dihate ber devê wê digot. Digot:

«- Goşt tune, kinc tune, sol tune, tişt tune... tiştên ku hene jî bi dest merivan nakevin...»

Ez hêrs bûm, di ciyê xwe de ricifim û min kir ku di dersxanê de biqîrim û bibêjim, «Tu ruyê xwe reş dikî, ku tunebûneke weha li welatê bavê te daketi be, de ka bibêje tu bi kuvarkên kîjan guherê mezin bûye, dêlik! Rast e, perê boyaxa dev û lêvên te ji te birîne. Lê ew pere, wek alîkarî ji hogirên Hebeşîstanê re hatiye şandin, têgêlnîştî!» lê zimanê min têr ne kir ku ez van gotinên dilê xwe jê re bibêjim. Hemî kesên di dersxanê de jî wek berxikan guhdariya wê dikirin. Tenê ez rabûm û min jê re got:

11



«- Tu derewan dikî.»

A, wê çaxê tev hemî xwendekarên dersxanê, Mervanoyê me jî rabû piştgiriya keçikê kir û ji min re got:

«- Tu neheqiyane li keçikê dikî. Te ew welata tenê bihîstiye, lê keçik li wir jiyaye û li wir mezin bûye. Ew, ji te baştir bi welatê xwe dizane!»

Ez vegeyriyam ser û min jê re got:

«- Mervan, çiyê te û vê antî-komînîstê bi hev dikeve, bavê min?!.. Ma ji bo te ne şerm e ku tu xwe dikî rewşa parêzgerê wê? Te bi salan ji bo sîstemeke wusa şer kiriye. Ku rewşa mayîna li welêt dest bida, te ê jî mîna min... heta ku çavên te di kortikên xwe de biçûya xwarê, simbêl û porê te mişt tayên sipî bibûya, xelekên reş xwe bera binê çavên te bida û ruyê te biqermiçiya... te ê şer bikira. Erê, ez wek navê xwe jî dizanim ku te ê şer bikira! Lê çawa tu anuha radibî derewên keçeke beradayî rast dipeyitîhî, ez têngêhîjim!?!..»

Lê Mervano wek feylesofekî serhişk li min vegeyrand û got:

«- Çi şer, çi dagêr, çi rêdar û çi sîstem dibe bila bibe, divê ji bo jiyaneke xweş be: jiyaneke bi goşt, jiyaneke bi kinc û jiyaneke bi sol be...»

Min baş bala xwe dayê ku ew rasterast wan gotinên keçika beradayî li min vedigerîne. Wê çaxê jîbi hêrs vegeyriyam ser û min gotê:

«- Serê te û feylesofiya te bixwe!»

Dûre bi enirîn rabûm ser xwe, ber bi dêrî çûm, derketim der, min derî hişka li pey xwe girt û careke din jî li wê dersxanê venegeriyam. Ez bawer im hemî kesên di wê dersxanê de jî têngêhîştin ku ez çiqasî hêrs bû bûm... A, ji wê rojê û vir de jî

ez û wî, em êdî hevdu nabînin.

Piştî vê çîroka xwe û Mervano, Gelto vedigere ser Xusrew û dibêje:

- De ka tu bibêje, ezbenî. Ma ne tiştê seyr e ku yekî nola min û Mervano rabe, piştgiriya keçeke weha bike?.. Keçeke ku ji welatê xwe î sosyalîst reviya be!.. Bi şerefa min û te, şîrê wê heram e!.. Ma ne şîrheram be, ji sîstemeke sosyalîst direve? Ma ew bi xwe jî nabîne ku tevayiya gelên dunyayê ji bo

12

sîstemeke wusa xwîna xwe dirêjînin!

Mîha ku Gelto bi vê hevoka xwe ya dawîn re hinekî jî hêrs bû be, destê xwe davêje qirpika şûşa vodka, piyalan dadigirê û dibê:

- Lê serê xwe bixwe, dev jê ber de em îşev çêlî polîtîkayê nekin... emji xwe re vexwun.

Herdu piyalên dagirtî bi du peyvikên noş li hev dikevin û ber bi ciyên pêwîst xwar dibin. Piştî qultekê, Xusrew piyala xwe dadixe, bi mitûmatî li hevalê xwe dinêre û dibîne ku wî çawa çavên xwe girtine û heta dilopa dawûi jî piyalê di devê xwe de diguşiîne. Dûre Gelto bi oxûieke dirêj re diranên xwe bi hev de dişidîne, du sê caran çavên xwe dikuskusîne û piyala li ber Xusrew dibêhe. Dixwaze bi matmayîn li hevalê xwe binêre û herweha du awurên matmayî li hev dikevin.

Gelto bi pilepil serê xwe dixwe ber xwe û dibê:

- Ev çi ye, ezbenî?.. ma meriv weke te vedixwe?

Xusrew hîh bi wê matmayîna xwe ye û dibê:

- Bi navê Xwedê, heta roja îroyîn jî min ne dîtiye ku kesek weke te vê vodka weha hişk vedixwe. Malava!.. Ma ev vodka

ye, malava, vodka! Bi kêmanî te pepsi-cola û cemed jî li nav bixista, dîsa dibû. Lê...

Gelto:

- Lê... Pepsî-cola şerbeta emperyalîstan e... Ez difikirîm ku em ê îşev dev ji polîtîkayê berdin... em ê ji xwe re vexwun, dibêje, dîsa destê xwe dirêjî şûşê dike, piyala xwe ya vala dadigirê û didomîne: Lê mîna ku tu jî dibînî, herçiqas meriv nexwazin jî destê merivan ji polîtîkayê nabe... Em bi aveke polîtîkî hatine avdan. Binêre Xusrew, ne ku ez bi van gotinên xwe pesnê Sovyetê... pesnê sîstemê didim. Lê bi rastî jî mêrikan pir xweş çêkirine. Wusa xweş çêkirine ku pêwîstiya dilopeke serbeta emperyalîstan jî nake ku meriv li nav bixîhe. Ez hertim ji vê vodkayê vedixwum. Bawer bikî... carina ez du şûşan jî didim ber hev û vedixwum. Vexwarina vê vodkayê pir xweş e. Tew merivan nayêşîhe, wek şîrekî nûdotî di gewriya meriv de xwe bera jêr dide û di dest de merivan sermest dike...

13

Piştî ku Gelto wê piyala şîrê nûdotî jî di gewriya xwe de bera jêr dide, pê xwe sermest dike, destekî xwe ber bi xwarinekê dirêj dike, li gotinên xwe yê jorîn zêde dike û dibêje:

- A, ev jî yek ji wan seletên wan î populertir e. Wek ku tu jî dibînî: kartol û hêkên xaşandî, goştê beraz û mirîşkan, pîvaz û gizêr, û baqilên xatûnî li nav hev dikeve... û ev xwarina pîrozwer jê derdikeve. Ev hemî nexşên ha jî hevaleyê min ji min re goti bû. Li Moskvayê dixwîne. Digot, meriv qeymax jî li nav dixîne. Bi ûrisî jî navek lê fikir, Xwedêyo! Çi navekî xweş e! Salat Stolîçnîy(\*).

Heta ku şûşe vala dibe, Xusrew jî hêdî hêdî dixwe, vedixwe

û her guhdariya hevalê xwe dike. Lê her ku Gelto vedixwe,  
serî lê germ û ziman lê dirêjtir dibe. Li ser hertiştî  
dipeyive. Di dawiyê re jî dema li ser çem û çiyar dipeyive,  
pesnê hinek tiştan dide û weha dibêje:

- Zozanên Êral ji zozanên Rocky Mountains'ê hêniktir û  
hêşîntir e... ava çemê Volgay'ê ji ava Mîssîssîppiyê zelaltir û  
xweştir e...

Bêyî daxwaza xwe, Xusrew li vir peyva hevalê xwe dibire û  
ji nişka ve:

- Tu çawa dizanî?..

- Çi çawa dizanim?

Mîna ku Xusrew ji pîrsa xwe poşmam bû be, hinekî nermtir  
dibêje:

- Ango tu çawa dizanî... hêniktir û hêşîntir e, an jî zelaltir û  
xweştir e? Na xwe tu heta wan deran jî çûyî?

Nola ku Gelto bixwaze tiştêkî pêşan bide, destê xwe radike  
ûdibê:

- Na. Ev hemî tiştên ha min di pirtûkekê de xwendî bû,  
min di nexşeyekê de dîtî bû... Ne tenê min di nexşeyekê de jî  
dîtî bû. Herweha min ji hinekan jî bihîstî bû... Ji hinek devên  
ewle...

Xusrew bi pişirîneke heyfîn li hevalê xwe vedigerîne û di-

(\*) Salat Stolîçnîy: Seleta Paytextê. WW

14

bêje:

- Binêre kekê Gelto. Bi rastî jî pîr kêfa min ji te re tê. Bi  
taybetî jî guhertinên ku di te de bûne. Lê çiqas heyf e ku... zimanê  
min nagere ku ez van gotinan ji te re bibêjim. Lê ku tu

li min negjrêyî, wê çaxê ez ê bibêjim hinekî jî serê xwe biguherîne.  
Binêre, tu çêlî hinek tiştan dikî û tu bi xwe jî dibêjî;  
min bihîstine an jî di nexşe û pirtûkekê de xwendine...

Gelto berê xwe dide hevalê xwe û dibê:

- Xusrew, çavê min! Ez jî ji te hez dikim... weke birayekî  
xwe î piçûk ji te hez dikim. Lê ez ji hertiştên sîstemê jî hez didikim.  
Tu viya jî bide xatirê ruhê min î sosyalîst. Û ya din, ma  
ne xweştir e? Bi serê min û te bajarên wan, merivên wan, navên  
wan... bi kurtî hertiştên wan xweştir e, Xusrew! Hertiştên  
wan!..

Bi van gotinên xwe re Gelto destê xwe davêje şûşa vala, radike,  
lê dinêre, dûre hinekî jî bi serxweşî bi masê de dide û  
dibêje:

- Vodka wan jî xweş e.

Xusrew serê xwe dike ber xwe, di dilê xwe de, «Na!.. serê  
Gelto ji berê jî kevntir e. Di warê xwarin û vexwarinê de gavek  
havêtiye, lê ew gava xwe jî berwar havêtiye.» dibêje, dûre  
bi çavekî bêhêvî û xemsarî li hevalê xwe dinêre û bi pişirîn dibêje:

- Ez dibêm qeyê tu hîna çîroka vê vodkayê jî nizanî.

Gelto bi serekî germ û çavekî matmayî:

- Çawa, çîroka vodkayê? dibêje.

- Ango li kuderê, çawa derketiye... dûre çî bi serê vî navî  
de hatiye...

Gelto bi ken herdu destên xwe ber bi şûşa vodkayê dirêj  
dike, peyvên Xusrew dibire û dibê:

- Çawa nizamim, ezbenî! Smîrnoff e. Navekî xurû sovyetî  
ye.

- Rast e, navekî ûrisî ye. Lê bi taybetî li Amerikayê weke

patent cî girtiye û li çend welatên din jî derdikeve.

Gelto bi enirîn di bin çavan re li Xusrew dinêre, hinekî jî bi hêrs dibêje:

15

- Ez nizanim tu tinazên xwe dikî, an te dil heye ku tu jîmin hêrs bikî. Smîrnoff çima li Amerîkayê derdikeve, ez têngêhîjim! Xusrew radihêje şûşa vala, mîna ku bi tiliyên xwe tiştên li ser şûşê pêşanî hevalê xwe bide û dibê:

- Binêre, ezbenî, di dema Çar AleksandrJII.de merivekî bi navê Pîerre Smîrnoff heye, siparişa hemî mey û vexwarinên welêt û bi taybetî jîya derûdora qesrê ew dike. Bi hinek rê û formulên xwe yên nû, Pîerre Smîrnoff li dor sala 1818'an vî vodkayê çêdike. Lê bi hatina şoreşa oktoberê re, ji bilî kurê wî yê bi navê Vladîmîr, tev fabrîka wî serê hemî kesên malbata wî jî wenda dibe. Vladîmîr, tev formula vodka bavê xwe, di ser Polonyayê re direve Fransayê û ji wir jî diçe Amerîkayê. Li wir, bi alîkariya tacirên dewlemend fabrîkek tê damezrandin û vî vodkayê dîsa çêdikin... Bi gotineke din, weke wê şîrherama polonî, xwediyê vî vodkayê jî ji welatê xwe î sosyalîst direve.

Gelto bi rewşek matmayî li hevalê xwe dinêre û bêdeng guhdariya wî dike. Wek sofîyekî ku destê wî bi destê xirabjinekê bû be û destmêja wî hati be şikandin, di ciyê xwe de sipûsar dibe û ditengije.

Ew hemû mijarên ku dûre di navbera herdu hevalbendan de dibe û didome, Gelto zêde beşdarî wan nabe. Her li şûşa vala dinêre û difikire. Ji nişka ve dilê wî li hev dikeve û verşîya wî tê. Dema bi destûra havalê xwe ji ber masê radibe û

ber bi destşokê diçe, di ber xwe de dike pilepil û dibê:

- Ez bawer im, min îşev pir vexwar.

16

### BÎRANÎNÊN XATÛNEKÊ

Li navçeyekî kêleka deryayekê, li ber devê avê, xaniyekî kevnare î li ser du qatan heye. Ji bo hênikayiya serê vê êvara payîzê, herdu pencerên rûberûyê avê vekirî ne. Ji bilî xweşdengê piyanoyê bêhna bêdengiyek bêliv ji vî qatê duduyan tê. Ev deng, di pencerên vekirî re derdikeve, di nav refên çûkmasiyan re pêl dide, li ruyê ava hember belav dibe û diçe. Ne pêwîst e ku em têkevin vî xaniyê xweşik û sîxuriya hundurê odê bikin. Lewra têra me dike ku tenê em bizani bin aniha li hemberî wênexaça pîrozwera ku bi dîwêr ve û li ber piyanoyek xemgm, xatûnek rûniştîye, bi pêlên xweşdengê piyanoyê re di ser sal û demsalên jiyana xwe re gav dike, diçe cî û warên ciwaniya xwe, ji wir hêdî hêdî vedigere, tê li îroya payîza sala çûyî dilikume û li wir noqî ramanên kwîr dibe: Sala çûyî li êvara vê rojê, ez û wî rûniştî bûn, weke salên hersalîn me sersala zewaca xwe pîroz dikir. Ronahiya findên li ser masa me, li ser ruyên me yên qermiçî xemgîh xemgîn di-

17

pirpitî. Ji şeraba sor, me piyalên xwe yên dawîn nivî kiri bû. Serî li me herduyan jî germ û laş li me sist bû bû. Wî destê xwe havêt albuma li ber selika fêkiyên ser masê, ber bi xwe kişand, piştî ku li derûdora wê nêhirî, vegeriya ser min û got: «- Belê, belê... xatûn! Jiyanek dûr û dirêj bi demên xwe yên çê û xirab li me buhurî. Ka kê dizanî bû ku em ê rojekê bibin kal û pîreke wusa. Meriv bi mirina xwe bawer dike lê bi

pîrbûna xwe, na! Jiyana weke avê îî me herikî!...»

Ez keti bûm nava ramanên kwîr û Xwedê dizane bê di jiyana xwe de min li kîjan demên xwe yên xweş temaşe dikir. Lê wî du sê caran li albumê xist û bi tepîha destê xwe, ez ji ramanên min kirim û peyivîna xwe domand:

«- Lê aniha ew hemî xortaniya me ya xweş, li ser van kaxizên vemirî û di hundurê vê albumê de ne. Ew heşaşiyên me, ew daxwazên me yên ku serî li me hildidan û em li ser hev dîn dikirin... hemî.. hemî jî di nava rûpelên vê albuma piçûk de bêdeng bêdeng disitirin.»

Bêdengiya min her li ser min bû. Rûpel bi rûpel wî lê dinêrî, di ser hev de diquliband, cari aa ji kwîr de keser vedidan, carina jî pişirînên heyfê bi lêvên wî yên qermiçî diketin û digot: «- XwedêyoL. Ku bi hişê min î îro gengaz bûya, min ê ev hemîjiyana xwe ya mayî, bi rojê wê demê biguheranda. Tu ewqas xweşik, ewqas sipehî, ewqas bedew bûy ku!... Ez çî dizanim, xatûn! Çawa bibêjim... Ez nikarim bextiyariya xwe ya wê demê bi lêv bikim. Pirî caran ez li ber Xwedê asê dibûm û min digot: «Xwedê, te çima ji bilî min mêr bi ruyê dunyayê xistine!» Lê bi viya min gunehê te dbdst hustuyê xwe. Nebe, nebe...» min digot, «..jcatûna min bi çavekî xirab li mêrekî binêre! » Gerçî min dizanî bû tiştên wusa li dor xatûna min tune. Lê ez gelekî dirtirsiyam... gelekîl Ji min wetrê te ê yekî ji min lihevhatîtir bidîta û ez berdama. Lê wek ku min got, pêjnên heşaşiya xortaniyê bûn ev. Şeytan diket biçengê min, şik li dilê min radibû û min digot: «Xatûna min ê rojekê ji nava lepê min derkeve, wek kevotekê bejî ji dest min bifire û biçê... biçê û ez jî bi awakî ewk... li pey wê binêrim.» Lê ez ani-



ha têdigêhîjim ku min çiqas gunehê te tewş tewş xistiye hustuyê xwe! Li min bibore, xatûna min... bibore ku ji xêra vê şeraba sor re ez ji te re pencera dilê xwe vedikim... vedikim ku tu bizani bî... tasa serê xwe vaca dikim ku tu fam bikî ka ez wê çaxê çi difikirîm û naha çawa difikirim.»

Bi vê gotina xwe ya dawm re destê xwe î jar da ser destê min. Di bêdengiyêke sar de min guhdariya wî fikir û dipa ku hîn çi bibêje. Ya rastî, ji hêlekê ve tevziyên tirsê bi laşê min digirt û ji hêla din ve jî min dixwest ew her bipeyive. Di peyivîna xwe de pirî caran mîna ku kelagirî li gewriya wî bipiçike, hevokên wî nîvçe diman û dûre dîsa didomand:

«- Binêre, xatûna min. Pêwendiyên xweş, hertim xweş in... li her deverê... bi herkesî re xweş in!... Ma gunehkarî ye ku meriv ji hev hez bikin? AxL. ev meriv çi aferîdên seyr in, Xwedê! Çima meriv weke kevokan, nola pisikan, fena kûçikan... mîha hemî aferîdên din serbest nejîh? Çima Xwedê toqa girêdanê xistiye hustuyê me merivên reben tenê? Ez têngêhîjim! Meriv bi hev ve têne girêdan. Hişkîrî têne girêdan... wusa têne girêdan ku di xewnên şevên nîvê şevan de jî merivan bernade. Min didît, tu û siwarê hespekî kumêt li berwarê çiyakî xalî... hûn wenda dibûn. Ez bi pey we diketim, ne digîhştim we, li ser çogan rûdiniştim û min devê lûla filîhta xwe dida we. Min fikir ku ez lingê wê bikêşim, lê min dinêrî ew lûle di destê min de bûye gopalekî xwar. Di nava xwîdanê de vediniciqûn û min dinêrî ez di nav nivîhan de me. Heta destê sibê, xewa wê şevê li min diherimî û xwûi li min zuwa dibû. Te bi xwe jî dizanî bû. Çi dibû?... ango çi dibû ku yekî

maçek li dev û ruyê te bikira! An jî min doxîn li yekê sist... A va ye tu bi xwe jî dibînîl... ew xortaniya me, bextiyariya me, pêjnên me, hertiştên me... hertiştên me yên xweş bi çermekî çilmisî hatiye nixumandin û mirina me jî nêzflc e. Ew jiyana me, aniha li me bûye wek xewnên şevên nîvê şevan. Xatûna min... bi kurtî, ez bextiyarê rindbûna te bûm... lê ji ber hişê xwe î wê çaxê hertim jî ez bi piştikulî jiyam. Ku ez careke din werim dunyayê... Em çi aferîdên reben in, Xwedê! Meriv...»  
Ji nişka ve li ser rûpeleke albumê sekinî, roniya çavên xwe  
19

yên ximamî bera ser wêneyekî da, dûre bi tiliya xwe ya qermeçînîşandaû:  
«- A, ev merivê ha...» got. Li vir mîna ku yek vî dilê min î piçûk bide nav du keviran û bişidîne. Lewra min xwediyê wî wêneyî nas dikir. Di dilê xwe de: «Hey wax, piştî ewqas sal!» min got. Lê wek ku ez difikirîm, nibû. Wî peyvên xwe weha domand:

«- A ev merivê ha ne wusa bû. Ev tiştên ku ez aniha dibêjim, vî ciwamêrî wê çaxê gelek caran ji min re digot. Digot lê kê guhê xwe dida wî! <Jiyan» digot, «li ser çar lêkerên rengîn ava bûye. Çêbûyîn, vexwarin, ewk...kirin û mirin e. Herdu lêkerên pêş û paşîn ne di dest me de ne, lê...» Ez anuha têdigêhîjim ku ew meriva çiqas bêhnfere, zana û têngêgîştîyê jiyane bû. Bêyî ku serê xwe di ber de bêşîne, ew bi bextiyarîjiya û ji jiyane tamijî...»

Ricifiyên sar dîsa bi laşê min ketin û min di dilê xwe de digot:  
«Ku ev ne pêhesîneke wê bûyera min be, wê çaxê xerifîn, şêtbûyîn û mirin bi hev re hatin!» Lewra ku wî di ciwaniya xwe de ev tiştên ha bigota, min ê ewqas lê negirta. Lê piştî

jiyanek ewqas dirêj... Ji vê rewşê şika du tiştan kete dilê min. Lê min nêhirî ku na, ev jî wek ku ez difikirim, nine. Wî gelek pesnê dîtin û kirinên xwediyê vî wêneyî da, dilê min ji nav wan keviran filitî û bêhna min hinekî fere bû. Heta demeke dirêj jî wî her çêlî xwediyê vî wêneyî kir û bi awayekî comerdî dîtinên xwe yên li ser jin û mêran bi lêv kir. Bi zarekî wusa digot ku ez matmayî mam.

Bi rastî jî ev êdî ne serxweşiya serê vê êvarê bû û ne jî xerifînek derengketî bû. Ev rasterast guherînek bingehîn bû. Heta derengî wextê jî min her guhdariya vê zarxweşiya wî kir û êdî baş pê ewle bûm ku ew bi her awayî hatiye guhertin. Guhertin çiqas xweş e, Xwedê! Meriv bi hev re dûr û dirêj dipeyivin, ramanên xwe yên veşartî kat dikin, pencera dilê xwe ji hev re vedikin... Pêjnên wusa li min rabûn ku, min digot qeyê ez û wî tew bi hev re ne jiyane. Mîna ku ev cara pêşîn bû me hevdu nas dikir. Ya rastî di tevayiya jiyana zewaca me de jî, nola wê şevê xwîna min li wî ne keliya bû. Ku gotin di cî de

20  
be, piştî zewaca me ya sî û sê salan, dilê min kete wî. Dilê min wek dilê keceke berzewac pekiya, ji ciyê xwe rabûm, min xwe havêt hemêza wî û min xwe pê ve şidand. Xwedê dizane ew jî têngêhîşt ku heta wê gavê jî min weha jidil xwe ne siparti bû sîhgê wî. Ca bifikirin ku mêrekî têngêhîştî, zana, dilpak, ewle û rewşenbîr li pêş we rûniştî be û ji we daxwaza dilovaniyê bike... hûn ê çî bikin?

Ez gelekî fikirîm û di dawiya dawîh de min biryara xwe da ku ez jî serpehatiyeke xwe û xwediyê vî wêneyî kat bikim, û pê bidim zanîh ku jiyana me jinan jî renekî xwe heye û li

hemberî kesên têngêhîştî û bûyerên dilpekîn, ev renga dewlementir dibe. Min destê xwe dirêjî albumê kir, ji dest wî girt, dûrûdirêj li wêne nêhirî û bi xeyal li gelek salên buhurî vegeriyam. Li ser qerta rengvemirî jî, ew wek xwe î berê bû. Mîna ku tinazê xwe bi merivên reben bike û bibêje: «Di dawîya dawîn de hûn ê li gotinên min serwext bin.» dinêrî. Ez zivirîm ser ew î li pêş xwe û min gotê:

«- Binêre canekem, ez ê aniha ji te re qala bûyerekê bikim. Bûyereke kevn e. Lê ji bo her nivşên civakê nimûneyeke baş e. Wek ku tu jî bi kerem dibêjî, pêwendiyên di navbera jin û mêrekî de, nabe meriv bi gunehkariyê binavîne. Lewra xwediyê vî wêneyî jî weha digot: «Pêjn û pêwendiyên meriv tistekî wusa ye ku, ne fena kêrê derekî meriv jêdike û ne jî wek ta û derziyê tistekî nola pîne bi meriv ve dizeliqîne.» Ev tiştê rêdareke naturî û renekî civata şaristaniyê ye. Ya rastî, ji berê de ez xwediyê vê baweriyê me. Ango ji gelek salan û vir de... min jî ev dîtina xwe ji xwediyê vî wêneyî girti bû. Ku were bîra te, bi qasî sî sal berê, ji wan payîzan şevêkê êşêke giran li min rabû bû. Me pêre ne gîhandi bû ku em min bigîhînin nexweşxanê. Min û te, me ez kişandi bûm mala xwediyê vî wêneyî. Piştî ku wî ji te re got: «Hûn biçin, bila xatûn li vir di rihetiya xwe de bimîne.» wî jî çû kirtikek sabûn û hinek ava şîrgermî hanî. Berê destê xwe î zana di avê de dikir, di serdilê min re dida, dûre ew kirtika sabûnê digirt û hêdî hêdî mist dida. Merivekî bêhnfere bû. Ew li teniştê min rûnişt û heta demeke dirêj jî wî her serdilê min mist da. Mêrik tewş ne bû bû doktor! De-

21

ma ew dilopên ava şîrgermî ji tiliyên wî de di serdilê min î

piçûk de diçilkiyan, bawer bike, ji bêçiyên min heta tayê porê serê min, xweşkeweke wusa li min radibû ku... Xwedêyo! Tew ji bîra min naçe! Ew tîna wê avê, kewandina wan dilopan... ez hîn jî di xwe de hîs dikim. Di ber re jî ji min re çêlî her tiştên wusa fikir ku ez pê sermest dibûm û herweha ew êsa giran li min wenda dibû. «Pêjnên jin û mêran yek in.» digot. «Mêr divê bi mêraniya xwe nefire û pê pozbilind nebe. Lewra mêr çiqas quretiya mêraniyaxwe bike ûpêpozbilind be, ewqasjijînê dûrdikeve.»

»  
Ez çî ji te veşêrim... Doktor pêjnên dilê jinan ji min baştir dizanî bû. Rasterast jinologek bû. Çawa bibêjim... hêleke wî mêr û aliyekî wî jin bû. Gerçî hinek mêrên ehmeq, ji tîpên wusa re dibêjin serjinik, lê... lê ku em jin li xwe mikûr bîn û rastiya dilê xwe bibêjin, xeyalên me jinan jî hertim mêrekî wusa divêt. Wê çaxê jî min xwe ne girt û min weke jinekê ev daxwaza dilê xwe ji doktor re got. Li gor xwiyê xwe î naturî bêtî ku doktor deng bike, ev daxwaza min pejirand û me... me bi hev re ewk kir...»

Li vir wî bi dengekî nîvxeniqî çîroka min birî û got:

«- Ez bawer im, dûre jî gelek caran tîr li te radibû.»

«- Lebê?»

«- Lebê şêrîn, bawer im, dûre gelek carên din jî êşa şevên nîvê şevan li te radibû.»

«- Belê,» min gote wî. «dûre jî ev êşa li min bû wek xwiyekî zarokan.»

«- Ez têdigê...»

Lê ev peyvika dawîn di devê wî de nîvçe ma, gwîn lê vemirî û mîna ku pîpikên çavên wî li derekê aliqî be, her hûr û piçûk

bûn. Dûre bêyî ku li min binêre, rahişt wê piyala xwe ya nîvçemayî, ew jî vexwar, herdu destên xwe li ser masê dan ser hev, eniya xwe sipartê û wusa ma. Ew seriya ji ser wan destan ranebû. Min albuma di destê xwe de danî hêlekê, du sê caran ev destê xwe di ser wî porê şînbozî re bir û hanî, min bi çend dangan banî kir û got:

«- Bexê min, evîna min, bextiyariya min...»

22

Lê tew ne liviya. Wek postê şêrekî gurandî, li qeraxê wê masê li hev geriya bû. Di rabûna min de çend dilop hêsirê çavên min, di ser wî seriyê piçûk, wî seriyê pelixî û reben de rijyan.

Bi dilekî helisî û serekî serxweş ez rabûm ser xwe, ber bi piyanoyê çûm û nola anuha ev tiliyên min li ser çûn û hatin.

23

### LÊKOLÎNER

Ji bo ku ji giraniya xeweke derengketî bifilite, anuha Mîran derketiye kuça pêş mala xwe û ji xwe re digere. Di ramanên xwe de, ji wê bejna xwe ya bilnd dût e. Carina destê xwe davêje serê xwe ku porê xwe li aliyekî biqelibîne. Lê di her carên weha de tiliyên wî tavilê pê dide zanîn ku ji bilî çend tayên bêcir, tiştêkî bi navê por li ser serê wî tune. Wê çaxê jî pêwîst nake ku zêde bi wan bilîze. Cotek şekalên sivik bi ser lingên xwe ve kiriye, hustukura qutikê wî û delingên şalê wî qermiçîhe. Bi nêhirînek pêşîn re meriv dibê qeyê tev wan kinc û şekalên xwe, nû ji xewê rabûye. Lê na! Pirî caran nêhirînên pêşîn jî çewt bi merivan didine zanîn. Tev bêxewiyeke dijwar derketiye ber bayî. Bayekî serê êvarê li serê wî yê porweşîn

û serçavê wî dikeve, devê xwe ber bi jor ji hev dike, hêwayê dikişîne hundurê xwe û di serê xwe de weha dibêje:

«Divê hêwayên wan demên kevnare, ji hêwayên îroyîn paqijtir bin. Lewra di wan deman de ne agir û ne jî dûkel heye.»

24

Mîna ku bi darê zorê bera xewê dabe, piştî du sê sed gavên hêdî, ji bilî çend bawîşkên bêwext, xew li ser wî namîhe.

Lê dîsa jî rengên bêxewiya sê roj û du şevan xwe li bergeha wî dide xuyakirin. Serqisê: Gwînê wî zer bûye, dora çavên wî reş bûne û di kortikên xwe de çûne xwarê, rehên sipîçikên çavên wî sor bûne, dişewutin û dixurin. Ewjî mist dide, dixurîne û li mala xwe vedigere.

Dema di kuçê de ber bi malê dimeşe, hîn ji dûr ve fîstanê jinekê ber bi çavên wî dikeve. Nola ku herkes dibêje û wek hertim, jinên herî xweşik jî bala wî nakişîne, bi şev bi ro ew her bi ramanên xwe şa dibe. Di kuçê de fîstan nêzîkî wî dibe û di nasîna jinikê de dereng nakeve. Cîrana wî ye. Lê cîran ne, te divê bila ronîya çavê wî be. Jin! Bi taybetî jî ev cîrana wî. Lewra ev serê demekê ye ku bi xwî û tevgerên xwe, ev cîrana wî hertim du sê gavan li pêş civatê ye û ev rewşa wê jî carina bi ber çavên wî ketiye. Loma Mîran jî serê xwe dike ber xwe û naxwaze lê binêre. Lewra cîrana wî fîstanekî wusa tenik li xwe kişandiyê ku li gor saloxdana dil û çavên Mîran, ser û binê wê tê de xuyaye. Jora fîstan tune ye. Ango girikên piyê wê, paş hustuyê wê û heta defa singê wê jî vekirî ye. Gulokên herdu pêsîrên wê, heta nivî xuyane. Ev tevgirêdana jinika cîran nakeve serê wî û loma di dilê xwe de, lê bi hêrs dibêje: «Ehmeq! Ji wê wetrê ez ê lê binêrim, an jî silavê lê

hildim... Tiştêkî paqij li xwe nake! Tew dev û lêvên xwe jî di boyaxê de hetikandiye. Hîna pêr ji gund hatiye û nuha jî xwe wusa dixemilîne! Te çi zû tora bav û kalan ji bîr kir!.. Te çi zû xwiye xwe guherand û tu hînî tevgirêdana bajêr bûyî! Ma dê û dapîra te xwe wusa kirine!... Wext çiqas li me xirab geriyaye, Xwedê!»

Ya rastî ev rewşa wî jî bala cîrana wî dikişîne, lê weke Mîran, cîrana wî jî serê xwe dike ber xwe û pirsê wî nake. Lewra ew jî dizane, dizane ku pirtûkxana mala wî ji pirtûkên sitûr dagirtî ye, bihîstiye ku heta derengî şevê lapma wî pêketî ye û li ser tiştên zanistiyê lêkolînan dike.

Herweha bêyî ku pirsê hevdu bikin, herdu cîran di ber hev re derbas dibin, silaveke Xwedê jî li hev nakin û diçin.

25

Çer ku Mîran xwe digêhîne malê, ji bo çayeke giran hinek amadeyiyên pêwîst dike, li ber masa xwe rûdine, pirtûka xwe ya kevn ber bi xwe dikişîne, wê beşa şeva berê dibîne û ji nû ve dest bi xwendina wê dike. Dixwîne - Dîroka Xewê - Bi taybetî jî ev beşa pirtûkê ewqas bala wî dikişîne û ewqas dikeve serê wî ku bi herika hevokan re ramanên wî jî diherikin û diçin. Ku ji dengê ava çayê jî nebûya, Xwedê dizane wî ê bi raman xwe di qelişa dîroka çêbûna meriv de berdana xwarê, xwe bigîhanda wir û bi wan merivên pêşîn re bijiya. Lê anuha bi pilepileke kêfxweş ber bi ava çayê diçe û dibêje: «Xwedêyo, çi lêkolînerêkî mezin e! De ka xew tê bîra kê? Ka kê serê xwe di ber de dêşîne ku xew çi ye û çima heta roja îroyîn meriv radikevin? Bi taybetî jî bi şev! Ango çima ne bi ro... lê bi şev? Bi rastî jî mêrik lêkolîna xwe li ser mijareke baş



kiriye. Xew. Di roja îroyîn de herkes dizane ku wextek herî kurt jî, ji bo me merivan tiştêkî pir girîng e. Lê çima meriv dev ji vî xwiyê xwe bernadin, ez têngagêhîjim. Çima meriv ê ji sisiyan yekê jiyana xwe, an jî ji sisiyan yekê roja xwe bi awakî mirî bibuhurîne!.. Serqisê jiyana min: Ji bilî xewên demên zaroktiyê û ew hemû xewên bêwext, rasterast ez duwanzdeh salan raketim. Ma ev ne dîhitî ye? Ez bawer im mabdrabiya herî mezin jî ev e. Lewra lêkolîner dibêje... bi kurtebir bi zimanekî zelal dibêje ku: Merivên pêşîn, hay ji şev û roja xwe tune bûn. Bi ro di ronahiyê de li pey nêçira xwe dibezîyan û digeriyan. Dema ku ro diçû ava jî, wan hew didîtin ku hawirdor li wan tarî bû û çavên wan êdî nabîne. Wê çaxê jî di ciyê xwe de rûdiniştin û li bendî ronahiyekê diman. Di demên weha bê ro û bê heyveronê de, ji ber nêçira xwe ya wê rojê laşên wan tevizîne, di ber xwe de ponijîhe, hênijîne û dûre jîxewilmajî bûne. Piştî demên dûr û dirêj, ev xewilmajîya ha ji bo wan bûye xwiyekî pêwîst û di şikeftên dar û zinaran de ji xwe re xew çêkirine...»

Mîfan çaya xwe ya giran tîne dide ber pirtûka xwe ya vekirî, li gilopa lampa pêketî dinêre, bi dilekîşa herdu destên xwe di hev re dide û vê carê jî xwe bi xwe dîtînin xwe dibêje: «Lê em?.. em ne merivên demên tarî ne û ne jî em di qulikên dar

26

û zinaran de dijîh. Şikir ji Xwedê re ronahiya lampên îroyîn jî wek royê ye. Ma em ê çima rakevin, çima em ê xewê ji xwe re bikin rêdareke jiyane? Xew mirin e... erê ne mirinek ku em dibêjin, lê dîsa jî mirin e. Lê ez ê rayê hemû dunyayê bidim ku meriv dikare vi xwiyê raketinê ji holê rake!...»

Piştî van şirovên xwe Mîran dîsa di ser pirtûka xwe de xwar dibe. Hetanî nivê şevê jî her çaya xwe nû dike, dixwîne, diçe ava sar li serçavê xwe dike û dîsa tê dixwîhe. Lê bi berbanga sibê re tişteki nola serêşê, giraniya xwe dide ser laşê wî, lîlik bi çavên wî dikeve û hundurê çavên wî bêtir dişewute. Rêzên hevokan li ber çavên wî dipirpitin û li nav hev dikevin. Dema dizane ku êdî nikare xwendina pirtûkê bidiomîne, nola ku li xwe mikûr were di dilê xwe de: «Ne tişteki bi gotinê ye, ezbenî... xwiyekî ji mflyon û mflyon salan vir de ye, wusa bi rihetî nayê şikandin. Lê ez ê bişkînim!» dibêje, pirtûkê datîne û bi serbilindiyeke serketî ber bi deriyê eywanê diçe. Bi vekirina derî re bayekî destê sibê li çavên şilekî dikeve, bi nermikên kefa destên xwe herdu kortikên çavên xwe mist dide û dûre li pencerên hemû malên kuçê û pencerên derûcîranan dinêre. Lê ji bo Xwedê ronahiyeke herî piçûk jî di pencereyekê de naxuye. Di dilê xwe de dibêje: «Çiqas heyf e!... heyf e ku di vê taxê de yekî şiyar jî tune. Hemû raketine. Di xewa şevê de çûne xwarê. Heta destê sibê, heta rohilatê... kî dizane?.. dibe ku heta nivro jî rakevin. Ez dizanim hinek xirabên wusa hene ku weke kundiran heta piştî nivro jî radikevin. Dema ji xew jî şiyar dibin, piştî çavên wan dinepixin, poz û lêvên wan diwerimin û hew! Nezanên Xwedê!.. çi dizanin! Karkirin, xwarin, vexwarin... heta vê derê baş e, lê ew tenegehîştine ka raketin çi ye. Kalê wan, bavê wan raketine, wan jî îro xwe dane ser şopa wan û hew!.. Ku merivan di dîrokê de ew hemû wextên xewa xwe ji bo tişteki din buhurandi bûya, bi her awayî civaka dunyayê îro pêştetir dibû. Lê ka?..»

Bi van gotinên xwe re Mîran bi bêhtengî berê xwe dide

hundur, pirtûka xwe ji ser masê digjrê û diçe vê carê li ser dîwançê rûdine.

Hêj nîvê rûpelên pirtûka hêja di destê Mîran de maye ku

27

bixwîne. Dîwançe germ û nerm e. Ne mizemiza zarokekî û ne jî pilpila kewaniyekê tê bihîstin. Dora wî xewle û bêdeng e.

Ku ne ji tiştên avahiyek îroyîn û lampên pêketî bûya, wî ê jî xwe yekî ji wan merivên kevnare bidîta. Her cara ku ew rûpelekî ber bi çavên xwe yên piçûk nêzflc dike, bi raman diçe ba wan û di nava wan de dijî.

Bijangên Mîran lê giran dibin û hêdî hêdî xwe digêhînin hev. Çend caran li ber xwe dide û dike ku ew bijangên reş xwe negîhînin hev. Lê nikare. Wek çengalên zengalê bi hev ve kîp dibin û nema vedibin. Pirtûka sitûr ji dest wî de dixuşike hemêza wî û hustuyê wî di ser de xwar dibe. Mîna ku hustuyê xwe di ser qelişeke dîroka çêbûna meriv de xwar kiri be û li demên kevnare temaşe bike.

Bi çi awayî dibe bila bibe, lê anuha Mîran dibîne. Dibîne ku ew merivên pêşîn çawa bi darên dirêj ve hildiperikin, li pey pezkûvîyan dibezin, dûre bê sedem tarîyeke mezin dadikeve ser wan, ew jî di ciyê xwe de rûdinin û dihênijin. Dilê Mîran bi vê rewşa wan dişewute. Ber bi wan diçe, destê xwe dide ser milê yekî û bi dengê nizm jê re dibêje:

- Hustuyê we ê bêşe, ezbenî, xwe dirêj bikin.

Lê ne ew bi zimanê Mîran dizane û ne jî xwe dirêj dike.

Yek bi yek Mîran diçe ber hemiyan û wan ji êşa hustuyê wan haydar dike. Lê ji wan kesek jî têngêhîje.

Ji ber vê serhişkiya wan, êşek dikeve hustuyê Mîran û heta

demêke dirêj jî didome. Dema ku êşa hustuyê wî lê girantir dibe, destê xwe davêje paş hustuyê xwe û çavên wî vedibin. Du çavên serxew û matmayî di pencerê re li asimanan dinêrin û dibînin ku tîrêjên soraviya royê li binê zikê ewrên sipî dibiriqin. Mîran têdigêhîje ku ro li ber ava ye, xewa bêbext ji berbanga sibê heta anuha wexta wî vikûvala lê buhurandiye. Loma zûzûka gilêza ser lêva xwe ya jêrîh bi piyê xwe paqij dike, tavilê werima poz û lêvên xwe hîs dike û di ber xwe de li pirtûka hemêza xwe dinêre. Rûpelekî pirtûkê ji ava devê wî şil bûye. Mîna ku şeytanekî ew xapandi be, fena ku rojiya wî ya sê şev û sê rojan hati be şikandin, bi niçeniç radibe ser xwe û di oda xwe ya bêdeng de digere.

28

## NIVISKARÎ

Dema kewaniya wî û keça wî ketin hundur, weke hertim pêlên bêhtengiyê lê rabûn û di dilê xwe de : «Dîsa bi ser min de girtin. De were nivîskariyê bike!» got û zûzûka hevoka xwe ya dawîn jî nivisî. Lê vê carê ji xêra hevoka xwe ya dawîh re, kêfa wî xweş bû. Wek hertim ne kir birebir û li kewaniya xwe hêrs ne bû, di ser dergûşa xwe de jî ne qêriya... Herçiqaq dengê zengilê telefonê kêfrevîh hat jî, wî ne çû û bersiv ne da. Tiştê ku kir ev bû: Wî ew du sê perçên kaxizên li pêş xwe dan ser hev, bi lez ket odayek bêdeng û derî li ser xwe girt. Herweha ji peyvên kewaniyê, ji çinepina keçika xwe û ji dengê telefonê dûr, ew û kaxizên xwe bûn.

Tevayiya bala xwe da ser navaroka nivîsara xwe, ji hevoka pêşîn dest pê kir û bêje bi bêje xwend. Di demên weha de pirî caran guhên merivan dixetî û dengê herî nêzîk jî nabihîse.

Gerçê ji hêla eywanê pilepilek dihat û digot: «Na welle,  
xwe vedişêre! Sibê heta êvarê di binê qula xênê de mexel di-

29

keve... ji rûniştinê kurmî dibe, kurmîl... nizane bi keçikê re bilîze,  
peyvîha bi min re jî ji bîra kiriye. Roja xweş û bayê paqij  
ji bo wî tişteki vikûvala ye... Bila hemî mêr weha bûya! Çîrokan  
dinivisîne... hay ji xwe tune ku bi xwe bûye çîrok! Erê lêê,  
ji dengê telefonê jî direve...» Lê wî ne dibihîst, çawa ku mozek  
li ser gulikên nefela buharê dike vingînî, ev pilepila jî wusa  
dihat guhên wî û hew. Ji xwe ewqas zêde jî dom ne kir.

Piştî ku hevoka xwe ya dawîn jî xwend, çavên xwe bi hev de  
şidandin, lêvên wî lerizîn û tişteki weke bextiyariyê li ruyê wî  
belav bû. Xwedê dizane dema ku keça wî jî çêbû bû, xwe ewqas  
bextiyar û berhembâr ne dîtî bû. Lewra bêyî ku tişteki  
kêm an jî zêde hebe, di tevayiya vê çîroka wî de hemî bêje û  
hevok ewqas li hev hati bûn ku rexnegîrekî herî mezin jî, ew ê  
bigota: «A çîrok ev e ha!» Li ser vê bextiyariya xwe, ramanêke  
weha di serê wî de vejînî: «Ku ji bextiyariya qedandina nivisîna  
nivîsarên wan jî nebûya, hemû nivîskar ê bi jana zirav  
biketana. Lê ji xêra Xwedê re, piştî demekê çîrok an jî romana  
xwe dinivîsin, diqedînin û pê şa dibin.»

Bi xweşbûna çîroka xwe ewle bû. Lê dîsa jî diviya bû bi yekî  
bida xwendin. Bi kêfxweşî ev kaxizana berdan bêrflecek xwe  
û derî vekir. Ne xatûna wî dixwest çîrokên wî bixwîne û ne jî  
pîvana çîrokek baş dizanî bû. Keça wî du sê tîtik ber bi hemêza  
xwe ve kir û hanîn:

- Bavo, got, were em bilîzin.

Felemez zûzûka lê vegerand:

- Anuha ne wexta lîstikê ye, got û bi lez ber bi solên xwe çû. Keça wî gazinên zarokek çarsale kir û got:

- Bavê min jî tew bi min re nalîze, min dernaxîhe derve... min nagerîne... bavê min dîn e!

Bavê dîn, guhên xwe xetimandi bû carekê. Dema di kuça mala Hemreş de dimeşiya, mîna ku wan hemî kesên li kuçê çîroka di bêrîka wî de dixwendin. Loma heta ber derê mala Hemreş jî bi serbilindiya nivîskarekî meşiya û li zengilê dêrî xist. Piştî xêrxweşiyê hertimî Hemreş û Felemez çûn li dîwançê rûniştin. Çerçî jî, bajarî jî û tew şivan jî bi hev dişêwirin... Wê çaxê mafê nivîskaran jî heye ku bi hev bişêwirin.

30

Loma Felemez jî bi quretî destê xwe havêt bêrfîca xwe, kaxizên xwe derxist, dirêjî Hemreş kir û got:

- Fermo, a ji te re! Wek nivîskarekî nû û xwendevanekî baldar bixwîne... bixwîhe ka tu çi dibêjî. Ez bi jîriya te ya edebî bawer im. Lê ku hinek kêmasiyên piçûk hebin jî, hêvîdar im tu ê bidî xatirê nivîskarekî xwedîjin û zarok.

Hemreş kir ku tiştekî bibêje, lê ne got. Bi nefspiçûkî pişirî, bêdil kaxiz ji dest wî girtin û hustuyê xwe di ser de xwar kir. Mîha ku bêdeng silawatan bikêşîne, lêvên Felemez dîsa li ser hev ne hewiyan û her lerizîn. Lê taviê tiştekî bala wî kişand. Berê, dema ku dihat vê malê, ji berhemên nivîskarên herî mezin pirtûkên sitûr û tew carina pirtûka pîrozwer jî li ser vê masa ber wî vekirî bûn. Lê îro ji bilî vazoyê xweşik û çend kulflkên tê de, tiştek li ser masê tune bû. Xwest cixarekê bikêşe, lê xwelîdanik jî ji vir rabû bû. Ji nişka ve berê xwe da Hemreş û got:

- Ero, ma te devji kêşana cixarê berdaye, Hemreş?

Bêyî ku Hemreş çavên xwe ji ser wan kaxizên di dest xwe de bizivirîne:

- Imm... got û bi pişirîn li dereke kaxizê dinêrî. Dûre vegeriya ser Felemez:

- Belê, min cixare berdaye, got û rabû çû xwelîdanek hanî, li ser masê danî û domand. Min dev ji nivîskariyê jî berdaye, ezbenî. Her roj ez du caran heta daristana hember dibezim û tîm. Hêwa paqij e, daristan û dunya xweş e... Min ji xwe re keçek jî daye xwestin. Bi xêr ku ew jî were, wê çaxê barê min ê rast be... em ê ji xwe re mal û malbatekê rast bikin. Zarokên me ê çêbin... ya herî çêtir jî ev e. Ca bifikire ku malek min heye, jin jî heye.. tew ku zarokek jî bibe! Xwedêyo, meriv ê ji bo wan çi neke ku!...

Ji van gotinan tiştek ne diket serê Felemez. Bi mitûmatî cixare di destê xwe de bir û hanî, nizanî bû ku ew ê çi bibêje.

Tenê di ber xwe de:

- Dîhitî ye, got û cixara xwe vêxist.

Hemreş bi awurekî ewle:

- Çima dîhitî ye, ezbenî? Dîhitî ew bû ku heta anuha min

31

ev çend salên xwe yên xweş û dawîn li avarê, li van nivîsarên vikûvala buhurand. Erê em... ez dinivîsînim lê... lê nuha bihata çapkirin, xwendevan hebûya û bixwenda... ziman, ziman bûya!... tiştek ne gfliand jiyana min û ez ne bawer im ku ji vir û weha jî tiştekî bi ser bixîhe. Em... ez çi dikim? Heta derengî şevê rûdinim, xwe ji xewa xwe ya şêrîh dikim, qehwa reş vedixwim û bi cixarê hundurê xwe reş dikim!... Çi ye çi nine,

ez ê kirasekê nivîskariyê bi xwe de bikim. TewL. Gulê were hêcîra! Em ê nexweş bikevin, ezbenî, nexweş! Çima ez ê neheqiyê li xwe bikin, çima?

Felemez bi mitûmatî got:

- Ma ev neheqî ye, lo!

Hemreş xwe hinekî tûj kir:

- Neheqî nine, çi ye lê? De ka bibêje? got û bersiva xwe jî bi xwe da, binêre got: Ku ez mêrek bim û ev xaniya jî malek be, wê çaxê... wê çaxê ev mêra û ev mala jin û jiyaneke divêt, nivîsaran ne! Têgêhîştî? Ma tu dikarî bibêjî, biçe xwe bixesîne?...

Xwezila dilê min bi we kesên zewucî. Anuha min jî kevnek jinê hebûya, ez ji te re sond dixwim ku min ê destê xwe navêta darê pênuşê! Loma... loma biçe lingên xwe bişkîne, li ber çoga xatûna xwe rûne, bi hev şa bin, te keçeke wek zêr heye, destê wê bigirê, bigerîne û berpisiyariya bavtiya xwe bi cî bîne. Devji tiştê vala berde, ezbenî! Tu bala xwe nede min. A sibe dusibe çavên serê min jî bi dawa xatûnekê bikeve, çîroka min jî diqede. Min... min ji bêhtengiya xwe dest bi vî karê nivîsandinê kir. Lê ez dibihîsim ku hinek kes ji bo vî karî bêhna xwe teng dikin... hêrsa xwe ya mezin tîhin, gazinan ji jin û zafokên xwe dikin.

Mîna ku hati be xapandin, Felemez bi dengê gazindok got:

- Lê te pênc roj berê ev tişt ne digot. Dema me çêlî nivîskarên bi navûdeng dikir, te jî digot: «Nivîskarekî baş, ji nava jiyaneke dijwar derdikeve. Jiyana nivîskarekî çiqas teng û dijwar be, berhemên ji pînuşa wî jî ewqas giran, kwîr û xweş dibin.» Te destê xwe ber bi vê pirtûkxana xwe dirêj dikir û te



nimûnên nivîskariyê dida.

32

- Rast e, min dida. Lê min çawa dida? Kafka bêhna xwe teng ne kir. Dilê wî ji berê de teng bû û tu carî jî ew bêhna lê fere ne bû. Piraniya jiyana wî, nola min bi tenêtî buhurî. Dema rûdinişt û di nerihetîya şevê de berhemek xwe dinivîsî, ji bêhtengiyê bû. Maupassant heta axirînrojên xwe yên tîmarxanê jî, fena min bi xeyalê xatûneke xweşik jiya. Rast e, nav û dengê mezî bi pey xwe xistin, lê bi kêrî çî tê? Peykerên wan îro li her kuçê welatên wan hene... hene lê wê xirabjiyana wan ya buhurî bi şûn de venagerîne.

Hundurê Felemez digiriya, lêvên wî bêhêvî dipişirîn û dîsa bi dengê nivçe got:

- Ez ditirsim ku tiştêk bi te bûye. Em dixwazin jinên xwe berdî û ji zarokên xwe cîyê bin... cîyê bin ku bi hişkê zelal ewk bikin... lê tu jî rabûye bi pey çî ketiye...

Hemreş bi lez peyva wî birî û got:

- A ku tu wusa bifikirî, wê çaxê... wê çaxê ez ê bitirsim ku tiştêk bi te bûye. Meriv çima ji bo nivîsandîna çîrokekê jin û zarokên xwe berdî!...

- Baş e, tu guhdarî bike ez ji te re nimûneyeke astenga jin û zarokê bi lêv bikim. Mijareke xweş tê hişkê min. Beriya ku li kaxizê siwar bikim, dest pê dikim lehengê bûyera xwe di serê xwe de dbcemilînim û dibêjim«Mêrekê navsere û bi destûpê ye nuxtik Pozberan e nuxtik Di binê vî pozî de simbêleke reş û weke rêşî berwar daketiye nuxtik Bejna wî ya bilind bêhnok di nava kincên netewî de weke dara berûyê bilind û bilind dibe sê nuxtik li ber hev Pişteke neh mîtroiyî li nava vê

darê digere û digere dîsa sê nuxtik li ber hev» Dûre çi dikim,  
ezbenî? Ez xençereke zîvîn tev kalanê wê di ber vê piştê de  
dikime xwarê, dûre ez lehengê xwe li hespekî kumêt siwar dikim,  
berê wî didim berwarê çiyakî xalî... a wê çaxê dengê xatûna  
min tê û dibêje: «Ma ev keçika di hundur de tetirxanî  
bû, bi destê wê bigirê û hinekî derxîne derve.» Lê hêla din  
keçika ku tetirxanî bûye, di ser min de digirî, digirî, digirî...  
De fermo, ezbenî! Ka ew lehengê min, tev wê xemlûxêza xwe  
bi kuderê de çû? Ez bi Teyrê Sîmir jî bidime dû, ez ê nebînim.  
Lewra tu jî baş dizanî ku nivîskarî hinek pêlên xwe yên

33

taybetî hene. Heşa ji te wek pêlên gû. Çer ku zikê te nepbd,  
divê tu biçî û ewk bikî... êdî tu dizanî ilmê te fere ye. De îcar  
tu rabûye doza mal û malbatekê dikî, ezbenî. Ca bifikire, di  
rewşa zikêşeke weha de, xatûn bi piyê te bigirê û zarok bi pêşa  
te ve bizeliqe, tu ê çi bikî? Ma nivîskarî dibe? Na, ezbenî  
na!

Hemreş hustuyê xwe xwar kir, bi kenekî şêrîn vegeyriya ser  
Felemez û got:

- Rast e. Tu rast dibêjî. Ji bo nivîsarên berhemên baş, divê  
serê nivîskar zelal be, wexta wî hebe ku bala xwe bide ser pênuşa  
xwe ka pênuş çi vedirişe. Lê tiştê ku ez dibêjim ne ev e.

Ez dibêm, li mala xwe binêre. Pêwîst nake ku tu bibî nivîskar.

Ango ne karê te ye.

- Ango tu dibêjî, nenivîsîne?

- Erê lêê... nola min... devjê berde.

- Ê malava, ji sibê de ye tu çima vekirî nabêjî?

Mîna ku Hemreş li gunehkariyekê qelibê be, xwest bi awakî

nermtir pê bide famkirin:

- Binêre, ez ji te re dîtînên xwe bibêjim. Bi nivîsarên weha jî meriv navûdeng nadin, got, ji çîroka Felemez çend rêzên pêşîn girt û xwend:

«Bejna wî dirêj e, porê wî î fflîkî li ser serê wî fena beroşek reş e, serçavekî gulover jî bi pirçûpola riyekî reş nixumandiye, ji bilî du qulên çavan û serê pozekî dirêj -jê xêra Xwedê re dirêj e an ne, ew jî xuya nake- tişteke naxuye. Bi mêzekirinek pêşîn re meriv dikare têkeve şikê ku ew çîpên jar û zirav çawa di binê wî laşî de sekinîye. Ku meriv ji paş ve û hinekî jî ji dûr ve bala xwe bidinê, wek teşiyek koçerî ye. Ji ber vê yekê jî em navê wî wek Teşî bi kar bînin. Teşî!»

Piştî xwendinê, Hemreş dîsa vegeyriya ser Felemez û got:

- Çi ye ev? Na xwe tu jî dibêjî ev çîrok e!

Çav li serê Felemez tarî bûn, dilê wî di defa sîngê wî de mezin bû û mezin bû, bi dijwarîbêhn veda, hêdfîca ew kaxizana ji dest nivîskarê nû û xwendevanê baldar girt, piçî piçî çirand, da ber vazoya kulflkan, rabû ser xwe û got:

- De baş e, ez dizanim ji min nivîskar dernakeve. Rewşa

34

min dest nade. Ez bi jin û zarok im. Heta nuha min destê xwe li ber Xwedê venegirtiye û min lava tistekî jê ne kiriye. Lê anuha ez dikim... dikim û dibim: Xwedê, bihêle bila Hemreş heta nod û neh salan bijî. Lê tu nehêle ku çavên wî li sîng û berekî sipî bikeve! Lewra ji bo me nivîskar pêwîst in. Bi xatirê te, ezbenî!

Dema Felemez dîsa di wê kuçê de ber bi malê dihat, fena berê lêvên wî ne dilerizîn. Serê xwe kiri bû ber xwe û bi gavên

xemgîn dimeşiya û weha difikirî: «Ji xwe min ji berê de wenda kiri bû. Lê pir heyf e, heyf e ku Hemreş ê jî biçe... ew ê av û av biçe. Zewac, jin û zarok astengên nivîskariyê ne. Hemreş jî xwe pîs kiriye. Ew ê jî bizewuce.»

Dûre ramanek din wek birûskê di serê wî de veda û di dilê xwe de got: « Ev Hemresa jî îro pir guherî bû. Tevgera wî, dîtînên wî, ken û peyvên wî... bi çîroka min jî tinazê xwe dikir, nerind! Belê belê, nerindiyekê bi Hemreş girti bû. Dibe ku çavên wî ji xweşbûna çîroka min bar ne bû. Tiştêkî dûrî aqilan nine! Rûpelên dîrokê ji tiştên weha dagirtî ne...»

Bi tevliheviya ramanên weha Felemez dîsa xwe gihand malê.

Bi vekirina dêrî re xatûna wî bi rûkenî:

- Ez ê dûre dîsa silav û sipasiyên xwe li te bikim. Bi xatirê te!» got û telefon danî.

Wek leşgerekî birîndar Felemez xwest biçe nêzflcî xatûna xwe û ruyê wê î bi ken maç bike û bibêje: Min dev ji nivîsandinê berda. Lê wusa ne kir. Di dilê xwe de: «Metranekî jî peyv li ruyê Gogol xisti bû û jê re goti bû: Tiştên ku tu dinivisînî, şeytan ji te re dibêje. Ev yeka jî bû bû sedema şewutandina berhemên hêja.» got û zûzûka ber bi masa xwe ya nivîsandinê çû.

Rûkenî li ruyê xatûnê vemirî, dirêj dirêj li Felemez dinêrî û didît ku ew çawa bi hêrs û lez dinivisîne.

35

## MÊRXASÎ

Kewaniya malê dewê xwe jî çelqand û tev dîzikê hanî li ber textê nê danî. Bêhna hêkerûnên qijilî, ji eywanê heta oda mêvanan wusa gjrti bû serê malê ku dilê merivan pê dixewirî.

Hecî Uso ji ser sekûkê daket xwarê, şaşika li ser serê xwe ber bi jor hilda. Ji hêlekê ve bi awurên tûj li Ferzend dinêrî û ji hêlekê ve jî xwe ber bi textê nêrî dikir. Lê Ferzendê panzdesale ne hay ji vê awurtûjiya kalê xwe hebû û ne jî bêhna hêkerûnê bala wî belav dikir. Li ber pencerê rûniştî bû û pirtûka ku di dest de, bala wî bi tevayî kişandi bû ser navaroka xwe.

Wek Hecî Uso, em bi xwe jî nizanin ku Ferzend çi dixwend, mijara pirtûkê çi bû, an ew çi têdigêhîşt. Lê bi cir û tevgera xwe, bi mêşinî û efendîtiya xwe Ferzend li vî gundî an jî li vî bajarê piçûk navûdeng dabû. Baqiliya wî di devê xelkê de bû bû benîşt û herkesî ew bi tiliyan pêşanî hev dikirin. Textê nêrî amade bû bû û Hecî Uso xwe kişandi bû ber.

36

Her cara ku berê xwe dida Ferzend, ji awurtûjiyê bijang û biruhên wî xwe digihandin hev. Berê wî dil hebû ku bi tena serê xwe nan bixwe û banî Ferzend neke. Lê dûre bê sedem û bi hêrs banî kir û got:

- De rabe ser xwe û were!... Te çi serê xwe xistiye nava şeqên xwe? Ma tu ê jî rabî sibê ji min re bibî feylesof!?!... Tew...

- Ez va hatim, got û Ferzend hevoka li ber çavê xwe qedand, pirtûka vekirî danî kêleka xwe, hêdfica rabû ser xwe û ber bi textê nêrî çû.

Di vê navberê de Zîvoyê birayê Ferzend an jî bi gotineke din, neviyê din î Hecî Uso, bi hilkehilk kete hundur. Bi dîyîna wî re çav li serê Hecî Uso bû lîzok û di kortikên xwe de ne hewiyan. Ji kêfxweşî lêv lê dilerizîn û li ser hev ne ditebitîn. Xweş diyar bû ku Hecî Uso ji vî neviyê xwe dilxweş bû. Zîvo

jî hay ji vê rewşa kalê xwe hebû. Ji ber vê yekê di hîjdesaliya xwe de jî, li hemberî vê tevgera kalê xwe, şûmî û durûtiya zarokekî heftsale dikir. Bi ketina xwe ya hundur re li rûkeniya kalê xwe nêhirî û got:

- Tu îro çawa î, Hecî?

- Ez baş im, berxê min. Gelekî baş im!

Hecî Êso bi herdu neviyên xwe ve li ber textê xwarinê çog dabûn erdê û bi hev re hêkerûn dixwarin. Her cara ku li neviyê xwe î Zîvo dinêrî, pariyê xwe bi xurtî di namkiyê de dikir û bi dilxweşi di devê xwe de dadihanî. Lê dema ku di kêleka xwe re çav li neviyê xwe î Ferzend dixist, çavên wî di reş ve diçûn, dilê xwe li hev dixist û te digot qeyê ew ê aniha verişe. Wê çaxê jî di ser Ferzend de dikire pilepil. Vê carê jî weha kire pilepil:

- Tu bi qurbana min û navê Ferzend bî! Min jî nav li te kiriye...

Ferzend... Ferzo! Min çima navê Bizdo li te ne kir?..

Kero welle çilka xwînê di te de tune! Kî dibê çi bila bibê...

Ferzend weke hertim li hember van gotinên kalê xwe bêdeng ma û xwarina xwe domand. Hecî Êso berê xwe da Zîvo ûgot:

- Beranê kalê xwe!... paşmêrê min, kavirê min, mêrxasê min, pêxasê min...

37

Ferzend di ber xwe de pişirî û ji şeytanî re Hecî Êso ev pişirîna wî dît. Bi mirûzekî tirş û tal Hecî Êso li Ferzend nêhirî:

- Tu çi didanbeşiyê dikî? Ma ne wusa ye, serjinik! Ji te wetrê ew jî nola te serşûnik e! Qurbana Xwedê bim!... Diya te jî nuha dilê xwe xweş dike û dibê: min jî law haniye dunyayê!?..

Tew, tew, tewL. Lê divê tu viya baş bizani bî ku serşûnikiya mêran, doxînsistiya jinan û pişturmîtiya keran...

Kewaniya malê bûka Hecî Uso bêhay kete hundur, lê ev peyvên ha bihîst. Di ber xwe de bi pilepil:

- Hecî dîsa xerifî ye, got û derbasî hêla kungî bû. Hecî Uso bi wê awur û hêrsa xwe zivirî ser Zîvo û dîsa pesnê wî da:

- Ez bi qurbana tûlik û temeliya mêran bim! Ca binêre, kabokên wî kabokên mêran e. Pozê wî, biruhên wî, lê tew lepên wî!.. Xwedêyo! Qet ne pêwîst e ku meriv bibêje. Ero welle bila diya te tenê bibê: min law haniye dunyayê!

Bi van gotinên xwe re bêyî ku hay jê hebe, destê xwe î bi rûn jî di pişta Zîvo re da û domand:

- De ka tu bibêje, Zîvoyê min... Xwelî li serê min be! De qeyê ez jî ehmeqek bûm. Wê çaxê ava reş di çavên min de hati bû, kuliya zimanê min xwari bû.... Loma... loma min navê Zîvo li te danî. Lê ji vir û weha ez ê bi navê Zêro banî te bikim. Ma heyfa te nine!... De ka tu ji kalê xwe re bibêje, te îro çikir?

Bêyî ku Hecî Uso li bendî bersiva Zêro bimîne, peyvên xwe domand û got:

- Ez ji dirûvên mêran derdixim. Ez tenê dizanim ku tu çi mêr î! Tu çavên xwe tew ji hukumatê jî nakutî. Welle ez aniha dizanim ku; tu îro li mamostê xwe xeyidiye û bi hêrs ji dibistanê derketiye, di rê de te bi du sê kesan re pevçiniye û te dê û bavên wan jî daye ber çêr û dijûnan... û ez viya jî baş dizanim ku herkes zû bi zû newêre xwe bide ser şopa te... û ev hukumata jî, got û destê xwe ber bi pencerê rakir. Lewra çend malên efseran li pêş mala wan bûn.

Kewaniya malê diya neviyan dîsa li wir xuya bû, bê daxwaza xwe peyva Hecî Êso birî û got:

- Bi navê Xwedê, Hecî, te ew lawika wusa kaw hîn kiriye û

38

ji rê derxistiye.

Ferzend pariyê xwe î dawîn jî di devê xwe de danî, kasikek dew bi ser xwe de kir, destmala xwe ji bêrfîca xwe derxist û devê xwe paqij kir, bi şûn de vekîşiya û dîsa dest havête pirtûka xwe. Zêro jî zûzûka ji ser xwarinê rabû, çû ber pencerê, mîna bizineke zîyanî çavên xwe beloqî kir û li derve nêhirî. Dûre bêyî ku tiştêkî bibêje, ber bi dêrî çû. Heta ku solên xwe bi ser lingên xwe ve kir û derket jî, Hecî Êso her li pey wî bi kêfxweşî dinêrî û digot:

- Xwedê bi merivên mêr re be! Xocê Xizir bi hevalên wan be!...

Lê dema dît ku Ferzend dîsa dest bi xwendina pirtûkê kiriye, vegeriya ser û got:

- A tu jî di binê qula xênî de di ser pirtûkan de mexel bikeve. Mexel bikeve ca tu ê çî jê fam bikî! Lawo, ma tu jî rojekê di kuçan de bigeriya, bila carekê dê an bavê yekî bihata ber derê min û giliyê te bi min de bikira. Bila bigotana: «Neviyê te î Ferzend bi lawê me ve pevçiniye, dest havêtiye dawa keça me, lingê mirîşka me şikandiye...» Çî dibû? Ma ew ê kevir bibariya!

Lê ez dinêrim ew kezeba bi te re tuneye ku! Tu hertim ker î, tu rojekê nabî kûçik! Ma qet xwîna mêraniyê di te de tune?!... Tu jî carekê derkeve û di kuçan de xwe li ba bike, bila xelk bizani bin ku paşmêrên mala Hecî Êso jî hene. Di jiyana xwe de ez hertim serbilind bûm û heta naha jî wusa



mam. Ji bo ku li hafa Xwedê rûreş dernekevim, heft caran jî ez çûm Hecê, min eniya xwe di kevirê reş re da û ez hatim. Tirsê dilê min ev e ku di vê jiyana xwe ya sed û bîstale de ez ê bibim hustuxwarê vê rewşa te. Lê ez dizanim... baş dizanim ku guhên merivên tirsonek hertim xetimî ye, di ber de daketî ye û nabîhîse! Nola te!..

Bi rastî jî Ferzend ne dixwest van gotinên kalê xwe bibfluse. Ji ber vê bêdengiya wî, Hecî Êso dengê xwe bilintir kir û bi hêrs domand:

- Tu nabîhîsî, ne wusa ye! Kero welle min ji zû de di te derxistiye! Ew serê te... U felqê serê ewkê min çû ye... rûmeta te, a bi qasî vê kasika dewê tirş jî nîne, got, kasika dewê ku di

39  
dest de, di gewriya xwe de berda jêr.

Birebira Hecî Êso û ew dengê ku ji derve dihat, tevlihevî bû bû. Mîna ku li der û hundur pevçûnek li dar keti be. Ferzend di pencerê re bala xwe da derve ku çî bibîne! Zêro di kuçê de kemişîye ser kurê efserekî û lê dide. Ê du leşger ji ber derên malefseran dibezin ku xwe bigflûnin pevçûnê. Gelek derbas ne bû, leşgeran xwe gihandin Zêro, bi piyên wî girtin, ji ser lêwik rakirin, bi sîlekirin dan ber xwe û birin.

Mîna ku deh kes ji Hecî Êso re bibêje: ca tu jî di pencerê re li derve binêre, tişteke nîqutî dilê wî. Ji nişka ve ji ber textê nêr rabû ser xwe û zûzûka ber bi pencerê çû. Bi dengê şikebar:

- Çî ye, çî bûye? got û li kuçê nêhirî. Dît ku yekî nola Zêro di nava lepên leşgeran de ye û dibin. Bêyî ku çavên xwe ji wê bergehê bikute, bi gotin vejeriya ser Ferzend û gotê:

- Ma ew ne Zêro ye?

Ferzend bi pişirîn û dengekî nîvçe di ber xwe de got:

- Imm... Zêro ye. Wi dîsa pêşiya hukumatekê birîye.

Dest û lingên Hecî Êso li ba c\bûn, şaşika serê wî li hêlekê şemitî bû xwarê, dengê ku ji gewriya wî derdiket berz û nizm dibû û digot:

- Ero, ma qeyê tu jî qerfên xwe bi mêran dikî?.. De ka tu bi nînoga wî ya heram dikî? Pevçûn... pevçûn di navbera mêran de dibe, serê merivên mêr dişikê, merivên mêrxas dikevin zîndanên...

40

TIZBÎ

Hêj rojên min yên pêşîn bû ku ez keti bûm zîndanê.

Xalê Çeto bisaltirînê hemî zîndaniyan bû. Tayên sipî keti

bûn porê wî. Çavên wî di kort de çû bûn û jiya wî li dor pêncesalî

bû. Di zîndanê de tu kesî pê nizanî bû ku ji kengî de

zîndanî ye. Lewra çend zîndan guherti bû. Bisalbûyîna wî jî

dest ne dida ku bi zîndaniyên din re pêwendiyên xwe daniya.

Ku yekî silav lê hilbida, wî jî silav lê dikir û hew. Radibû, rûdinişt,

diçû derve, dihat hundur, li ser piştê xwe li ser cilên

xwe davêt û li siryaqan dinêrî. Min tu rojekê jî ne dît ku kesek

hat serlêdana wî. Min xwest ku mîna zîndaniyên din danûstandinên

xwe bi wî re jî daynim. Di pey du sê silavên germ re

min ew vexwend ser nivîhên xwe, çay jê re xwest û bi her

awayî qedrê wî kir.

Ciwamêro jî ji min hez kir, silavên jidil li min hilda û herweha

navîna me xweş bû. Merivekî zane û dîtî dixuya. Gelek

tiştên wî ne dihat fahmîn. Kêm dipeyvî lê pir difikirî, ewqas

41

ku meriv digot qeyê barê dunyayê li ser milên wî ye.  
Rojekê wî ez ezimandim ser cilên xwe. Liv û tevgera wî ewqas bala min kişandi bû ku bêpîvan... Di dîwarê paş serê wî de bizmarekî zengalî û bi bizmêr ve jî ji dendikên zeytûnan tizbîyek dardekirî bû. Min ne jimart, lê wusa xuya bû ku nod û nehîn bû. Ji toz û tewara ku lê dahati bû, benê wê ne dixuya. Ku tizbî nod û nehîn bûya, her nod û neh libên wê jî bi awakî teral rawestiya bûn. Weke rêza leşgerên naşî xilûxwarî bûn. Lê ya ku ez pirtir lê ecêmayî mam, ev bû: Wî tizbî ne dikişand. Min tu carekê jî tizbî di nava tiliyên wî de ne dît. Xwe bi xwe ez ketim geliyên ramanan û min got: «Hebe tune be, ev meriva yekî oldar e; sofî ye, mele ye, feqî ye, seyda ye...» Lê vî merivî nimêj jî ne fikir. Herweha ez tiştêkî têngêhîştim. Ez hîna wusa bi raman bûm, min dengêk bihîst.

- Tu çima wusa ji kwîf de difikirî, xorto?

Ez li xwe varqilîm, min çavên xwe ji tizbiya zeytûnî çerixand û min dît ku Xalê Çeto bi pişirînek xwînşêrîn li min dinêre.

Ji bo ku li xwe negirê, min got:

- Na, qet Xalê Çeto... Wusa bêhemd ez noqî ramanan bûm.

Em û wî bîstekî li ba hev man, dûre min xweşî lê kir û ez rabûm çûm ser nivînên xwe.

Rojekê min ji derve du tizbiyên reş û kevirîn da kirîn. Herdu jî ji hev xweşiktir bûn. Êvarekê bê ezimandin ez çûm ser cilên xalê Çeto. Ji vir û wir em peyivîh û me şev pîr kir. Dûre min destê xwe hêdîka xist bêrîka xwe, herdu tizbî jê derxistin û dan ber wî.

- Xalê Çeto, min ji bo diyariyê ev herdu tizbî ji derve

xwestin. Te kîjan divê, fermo.

Xalê Çeto bi qasekî bêdeng ma û dûre bi pişirîn serê xwe hejand:

- Na, xwarzî. Mala te ava!... Lê kêfa min j'i tizbiyan re nayê.

Bi van gotinên wî tiştekan nîqutî dilê min. Wê çaxê tégêhîştîm ku tiştekan di vê tizbiya wî ya zeytûnê de heye. Piştî Xalê Çeto nêhirî ku kêfa min reviya, li min vegerand û got:

- Tu li dilê xwe negirê, xwarzî! Bi rastî jî kêfa min ji tizbiy-

42

an re naye.

Bi nîvşermî min rahişt tizbiyên xwe û min ew dîsa xistin bêrlca xwe. Bê gotin min serê xwe rakir û li wê tizbiya dardekirî nêhirî. Lê kêfreviya ruyê min xweş xuya bû. Ez bawer im ji ber vê yekê jî bû ku Xalê Çeto bi şermesarî li min nêhirî, bi keservedan peyvên xwe domand û got:

- Lê tu nepirse û nebêje: Çima? Ku rojekê tu ji vê zîhdanê werî berdan, an jî ku te bişînin dereke din, wê çaxê ez ê ji te re kat bikim. Lê nuha ne...

\*\*\*

Di vê navberê de navîna min û Xalê Çeto bû danûstandina xal û xwarziyekî. Wî kat kir û min guh lê da, min kul û keserên dilê xwe vekirin û wî guhdar kir... Şev û rojan dan pey hev, dem buhurî û herweha çîroka tizbiyê jî ji bîfa min çû bû êdî. Sê salên min di vê zîndanê de buhurîn. Di van rojan de dergevanê zîndanê hate selula me û kaxiza roja berdana min pêşanî min da. Piştî sê rojên din ez ê ji zîndanê derketama. Ji bo mizgîniya xwe soza hevûrîyekî jîji min girt û çû. Di van sê rojên dawîn de, xwîna min bêtir li Xalê Çeto keliya û ez di

ber de diltenikî bûm.

Sê roj derbas bûn. Sibê zû dergevan bi dengekî banî min kir ku ez heta du saetan xwe amade bikim. Min tiştên xwe tev dikirin. Xalê Çeto jî bi min re alîkariya min dikir û nivînên min tev dişidand. Di binê şeltika min de, ew tizbiya ku min sê sal berê pêşkêşî wî kiri bû, derket rastê. Bi qasekî min bala xwe da tizbiyê, kete bîra min û dûre ez bi rûkenî zivirîm ser Xalê Çeto û min gotê:

- Ma tê bîra te, Xalê Çeto? Te ê ji min re kat bikira, ne wusa?

Bêyî ku dirêj bike û wextê bibuhurîne, Xalê Çeto li ser titika cî da xwe û rûnişt:

Dûrî te, ez wê çaxê mîna te hîna xort bûm û li ser xwe bûm. Ango ya ku bi serê min de hat, bila bi serê gurên çiyandeyê! Ez ji ezbeniyê xwe re bibêjim... Em hemî civata gund li ser qameta nimêja îniyê bûn. Me dest bi nimêjê kiri bû. Hundurê mizgeftê ji hecî û sofîyan heta firqûz û naşiyên 43

gund dagirtî bû. Civatê nimêj kiri bû, çog dabûn erdê bi tizbiyan, bi tiliyan bêdeng silawatên xwe dikişandin û li navê Mihemed direşandin...

Xalê Çeto bi mirûzekî tirş û tal destê xwe î çepê ber bi wê tizbiya xwe ya zeytûnî kir û got:

- A, min jî bi wê tizbiya xwe ya bêyom silawatên xwe dikişand. Ji bilî pistepista devê civatê tu deng tune bû. Ji şeytanî re dengekî xirab... Wek nalîna mîyek nexweş dest pê kir û deng hat birîn...

Xalê Çeto vê carê herdu destên xwe ber bi jor kir û ji

Xwedê lava kir:

- Xwedêyo! Ew ciwamêra kete binê erdê, bû xwelî û çû. Lê va ye ez li hafa te dibêjim. Ku ez çewt dibêjim, min ji herdu çavan bike!

Di pey deng re, ji bo ku zêde neyête bihîstin hinek kes kuxuyan û hinek jî di ber xwe de bi dizflca kenyan. Lê sofîyê ku li kêleka min bû, li nava çavên min nêhirî, tufî sarçavê min kir û di ser min de qêriya:

«- Çi ye, lawo! Hûn ji civatê şerm nakin, ma hûn ji Xwedê jî natirsin! De rabe ser xwe û derkeve der! Merivê Misilman çima bê destmêj hîna di mala Xwedê de rûdine!»

Bi van gotinên sofîyê kêleka min re, bû niçeniça civatê û serê xwe dihejandin. Ez ne bawer im ku di jiyana min de neheqiyek ewqas giran li min bû be. Ronî di çavên min de ne ma. Ez di bin xwîdanê ve bû bûm û çav li serê min tarî bû bûn. Ji hêrs û kerbê ne min wext dît ku ez bibêjim, «Bi navê Xwedê ew ne ez bûm.» û ne jî min pê re gihand ku ez bifikirim. Heta ku ez li xwe varqilîm, min xençer li xafika serdilê sofî xisti bû jî... Civat li nav hev keti bû û hinekan dixwestin bi min bigirên. Lê dest û pê li min bû bûn mîna ço û ez ne dihatim dest. Ji xwe çavên min tu kes ne didît. Min hew dengê bihîst:

«-Ero wî bernedin! Ca wî bernedin, tirek Apê Sofî jî kuşt! Kero... ma tu ê xwe têxîkuderê!...»

Di wê hêrsê de min xwe havêt ser wî dengî û min xençer bir û hanî. Dûre min xwe li ronahiya derê mala Xwedê girt û

44

ez di nava wê helhelê de bazdam derve... Herdu jî miri bûn.

Herweha ciwamêrekî tira xwe xisti bû hustuyê min û ji navîhê derketi bû... min jî xwîha du kesan xisti bû hustuyê xwe. Di çend rojên pêşîn de mala me û wan dest pê kirin li ber hev pan bûn, li pey hev geriyan... Xwîha du kesan bi min giran ne hat, lê ew navnotiya ku bi pey min ket, min dizanî bû ku ew ê heta mirinê jî wek pînekî xirab li min bimîne. Ji xwe j'i wê rojê û vir de min danûstandinên xwe ji malbata xwe jî birî. Ma min ê êdî bi çi ruyî li wan binêriya û di nava wan de bigeriyama?!... Li vir xalê Çeto bi keserek nîvçe got:

- Kesek bawer nake lê ya rastî jî ev bû.

Paşîngê jî ez hatim girtin. Belê ezbenî. Di dadgehê de dema dadpîrs biryar da û ez bi bîst û neh salan arihandim; min jî biryara xwe da, heta ku ez li darê dunyayê sax bim, ez ê tizbiyê nekişînim û lingên min ê bi mala Xwedê nekevin! Lê ji bo xatirê bavê xwe î rihmetî, ez vê tizbiya yadîgariya wî navêjim û wenda nakim.

Bi vê çîrokê re bêyî daxwaza xwe, ez noqî ramanan bûm û min di dilê xwe de got: «Xwedêyo! Ev çi tore ye? Ev çi...»

Dergevanê zîhdanê cara duduyan banî min kir ku ez bi derkevim. Bi destûra Xalê Çeto ez rabûm, xwarî destê wî bûm, min xatir jê xwest û ez ber bi dêrî çûm.

45

xwî

Ji rojan ber bi êvarek rojeke payîza paşîn e.

Mamosteya xweşik Jennifer Gardner li hêleke Londonê di dersxanekê de, li ber textê nivisînê rawestiyaye, tiliyên xwe yên dirêj û barflc ber bi lêvên xwe yên tenik û xweşik dike û «These are my lips» dibê. Ji hevokê, peyvika dawîn dubare dike

û dûre wek peyvikên din wê jî li têxt dinivisîne. Herweha xwendekarên wê yên nû jî têdigêhîjin û li ser kaxizên ber xwe dinivisînin. Piştî gelek bêj'eyên weha, mamoste di dersxanê de digere, diçe yek bi yek di ser xwendekarên xwe de xwar dibe ku bizani be ca ew rast dinivisînin, an ne. Tev wan peyvikên ku wê li têxt nivisîne, xwendekaran bi tîpên cuda cuda û li hemberî wan, bi zimanên xwe jî tiştina nivisîne. Piştî ku mamoste dibîne herkesî nivisîha bêjeyên li têxt qedandine, dizivire ser xwendekarên xwe û dibêje: «Thankyou, thanks!»

Simko û Baçîn jî ji xwendekarên vê dersxanê ne. Aniha di 46

kuçekê kêleka parka Richmond'ê de ber bi Broad Street'ê dimeşin û di rê de li ser çetiniya hînbûna vî zimanê biyanî dipeyivin. Pêlên bayê payîzê li tûlika Baçînê xort dixê û porê wî yê reş li ser eniya wî tevlihevî dike. Ev tevgirêdana wî ya sportîfî, rengê naşiyekî hercayî dide Baçîn. Bergeha Simko î li kêlekê jî, bi paltoyê xwe î rojhilata navîhî û çentê dîplomatî, bêhna tacirekî ermenî dide. Li dereke kêleka parkê, dema Simko dibîne paş û pêşê wan hinekî ji merivan xewle ye, çoga xwe ya çepê bilind dike, çentê xwe dide ser, bi pozbilindiya dîplomatekî xizan devê wî vedike, naylonek pêçayîjê derdixê û dirêjî Baçîn dike:

- Ero, ca viya bi du ciya bike em bbcwin, dibêje. Ji bo cixarê ez hertim weha tişteki davêjim hundurê çentê xwe. Bi qasekî din hûrên zerika hêka xaşandî li ser tayên simbêla Simko dixuyin. Beriya ku dest bi peyivîna xwe ya nîvçemayî bike, serê xwe ber bi jor dike û li asimanên payîzî dinêre. Ev



nêhirîna wî, bi demeke pir û pir kurt dibe. Lê wusa xuyaye ku bi vê nêhirîna wî re gelek payîzê salan di serê wî de divejine û zûzûka di ber çavên wî re dibuhurin. Loma dûre serê xwe dixê ber xwe, ji kwîr de keserekê vedide, vedigere ser Baçîn û jê re dibêje:

- Lê tu ê bîn bibî. Tu ê zû fêrî vî zimanî bibî. Lewra tu hêj pir ciwan î. Merivên ter û ciwan serê wan nerm in, zû têdigêhîjin. Lê ji bo min hînbûna vî zimanî gelek dijwar e. Herçiqas hînbûnek wusa zêde ji bo min ne pêwîst be jî, min pir dixwest ku ez rojekê bikani bim du peyvikan bi hev xînim û... lê wusa xuyaye ji vî salê xwe î çel û pêncan şûn de, ez ê nikani bim. Bi pişirînek şêrîn Baçîn:

- Tu ê jî hîn bibî, xalê Simko, dibê. Ev hêj du meh û çar rojên me ne ku me xwe havêtiye vî welatî û ev hefteyê sisiyan e, me dest bi hînbûna zimên kiriye. Ma di demek weha kurt de kî fêrî zimanekî nû bûye? Ca tu raweste, bila du sê salên me li vir bibuhurin, tu wê çaxê bibîhî ka em fêrî zimên dibin, an ne. Ma em ji kê kêmtir in! Çima afganî hîn dibin, em fêr nabin? Mîna ku mistek ava sar li ser dilê Simko bû be, destê xwe ber bi jor vedigirê û dibê:

47

- Welle em ji wan ne kêmtir in, lê... lê li welêt jî xwendina min tune bû, ha! Ji bilî zimanê malê û ewjî... tu bi xwe jî dizanî ez nikanim du tîpan bînim ba hev û bixwînim. Bavê min ez ne dam ber xwendinê, ez çî bikim! Tê bîra min di binê siya daran de rûdinişt û digot: «Xwendin çî ye? Ma bi xwendinê baskê teyran bi kê ve bûye? Ez ji kesên herî xwende jî zanetir im.» Lê dema ku meriv li rastiya jiyanê dinêre, wê çaxê têdigêhîje

ku ew gotinên bavê min hemîjî ji... ji ewkî bûn. Ya rastî, wî hay ji xwe tune bû, nizanî bû ku bi xwe çî dixwaze û çî dibêje. Gelek caran meriv tê derdbdst ku pêwendiyên dest û lingên wî jî bi hev tune. Wusa... Icar ji bo ku vê dîtina xwe ya bêhiş û bêbingeh bipeyitîne, di rabûn û rûniştina xwe de çêlî bapîrê min dikir û digot: «Ew jî ne xwende bû, lê oda wî hertim ji mêvanan dagirtî bû. Ji riya sê rojan merivna dihatin û pê dişêwirîn...»

Baçîn wusa têdigêhîje ku ev diltengiya dûrketina ji welêt e, xemgîniya ciwaniyek wendabûyî ye; û dixwaze pê bide zanîn ku ev ne tenê gunehkariya bav û bapîrê wî ye, loma peyva Simko dibire û dibêje:

- De... tu jî xema nexwe, xalê Simko. Ev tiştê ku tu dibêjî, xwiyekî civakî ye. Lê mîna ku min ji te re got: Di vê dersxanê de hêj çel û pênc saetê me ne buhurîhe. De ka nuha tu bibêje; ew peyvikên ku tu di van sê heftan de hîh bûye, ma hindik in? Tu fêrî çend peyvikan bûye, ka ji min re bibêje!

- Ez hîn bûme, hîn bûme... Ji dev û poz, heta tiştên di dersxanê de, ez yek bi yek navê hemiyan jî dizanim. Dizanim lê...

Li vir mîna ku Simko li tiştêkî varqile hinekî bêdeng dimîne, dûre tavalê li gotinên we zêde dike û dibêj'e:

- Lê meriv pirî wan tiştan jî ji bîf dike, ha! Serqisê ew bêjeyên ku em îro hîn bûne, heta sibê em ê nîvê wan ji bîf bikin. Icar divê meriv wan hemiyan ji ber bike, an ne, nabe!... Ku te bivê em ê nuha biçin ba min, em ê çayeke xwe vexwun û di ber re jî heta ku em baş hîn bibin, em ê peyvikan ji hev bipirsin. Ji xwe mala min jî ji vir ne dûr e.

Piştî ku Simko û Baçîn li ser vê yekê li hev dikin, herdu bi

hev re bi qasî deh werîsan bêdeng dimeşin. Ev bêdengiya bi  
48

pirseke Baçîh tê birîn û dibê:

- Bi rastî xaniyê te çawa ye, xalê Simko? Tu jê xweş î, an  
ne?

- Bi Xwedê, baş e. Oda min fere ye, maseyek û du sandaliyên  
nû tê de hene, dîwarên wê bi kaxizên xweşik in, xwarin...  
Lê cîranên min... ez li korîdorekê dimînim. Di korîdorê de  
em deh kes in. Ji bilî min, hemîjî ji van xortên xwendekar in,  
di xwendegehên bilind de dixwîhin. Em gişt, xwarinxanekê bi  
kar tînin. Cemedanka me jî herwusa... Ero, di van çend rojên  
dawîh de tiştêkî bala min kişand: Min nêhirî ku tiştê min yê  
xwarinê zû kêmbin. Ez fikirîm ku şeytên tiliya xwe ne xisti  
be nava xwarinên min, wê çaxê... wê çaxê Xwedê dizane ev  
karê xwendekarên korîdora min e. Welle, dûre ji du tiştan şik  
kete dilê min: Yek şeytan û yê din jî xwendekarên li korîdorê...  
Belê, belê!... wusa nepişire tu! Wek ku şeytan bi min re  
bixwe... tiştên min kêmbin. Binêre ez pakêteke hêk dikirim,  
dibim di cemedankê de datînim, sibê diçim lê dinêrim...  
dinêrim ku hêkên min kêmbûne. Penîrê min, rûnê min dîsa  
wer, nanê min... nan lo, ma nan çî ye!... meriv davêje ber kûçikan!  
Tu dizanî min çî kir? Ez gelekî fikirîm û min serê xwe  
pir di ber de eşand. Eşand lê... lê min nizanî bû bi çî awayî û  
çi qas jê kêmbibe. Ma kê bêhna bêçiya xwe kiriye û beriya raketinê  
biçe li tiştên xwe binêre!... Vêca min bi van çavên xwe  
nedîta, min ê bawer nekira. Piştî vê şika xwe, welle min xwe  
da ber ku bibînim ka kî vê nefsmirdariyê dike. Bi serê min  
te... belê, do derengî şevê bû. Ez di oda xwe de ramedî bûm.

Min dengê lingan bihîst ku ber bi xwarinxana korîdorê diçe. Ez jî rabûm û min hêdfilca da pey. Xortekî fînî bû. Ero, çer ku wî derê cemedankê vekir û destê xwe dirêjî hundurê wê kir, welle min hişkfirî bi zenda wî girt. Destê wî li hewa ma. Çav li serê min tarî bûn û welle çi hat ber devê min, min jê re got: «Ev çi karê te ye, bêşeref!» min gotê. «Tu mestûmezin, bi qasî terikekî ye, riswa! Ma ev bi te dikeve?» Lê ez bawer im gelekî tirsîya. Lewra çer ku zenda xwe ji nav lepên min filitand, weke cêwrekî tajiyeke sow ji ber min bazda. Ez xalê te me! Ma ez êdî wî berdidim! Welle di korîdorê de min da pey. Ez di

49

ser de qêriyam û min gotê: «Kero, tu ê vê carê xwe têxî kuderê!» Di vê birebira min de, keçikek fînî ji oda xwe derket ber dêrî û vî bênamûsî xwe havêt paş wê û jê re got: «Ez di bextê te de, min ji nav lepê viya xelas bike!» Eê... tu dizanî, li ba me jî yekî ku xwe bavêje bextê jinan, dest lê ranabe. Edî ne bû ku li ba keçikê ez xwe rakêşime wî, lê min ew rezfl û riswa kir: «Kero, tu bi qurbana vê keçikê bî!» min gotê. «Ku ne ji bo xatirê vê keçikê bûya, min dizanî bû anuha min ê çi bihaniya serê te!» Lê baş bû ku keçik ciwanik derket û bi zarekî xweş ji min re got: «Ez di bextê te û Xwedê de, xalê Simko! Wî kiriye tu neke! Dev jê berde!...» Dema keçikê ev digotin û ber min digeriya, ew jî li paş wê nola pisikê ku şîr rijandi be, her bi çavekî tirsek li dor xwe dinêrî. De... ka nuha tu bibêje Baçînê min, ku tu di şûna min de bûya, te ê çi bikira? Lêê... A, çilekên wusa bêrû jî hene! Welle min rabû ji bêgavî ji keçikê re got: «De bila vê carê weha be, lê ku ew careke din tişteki wusa bike, bi sonda sê kevirên jinberdanê ez ê destê wî bişikînim

û... nizanim çi bikim!» Û nemaze min bi wê da zanîn ku careke din jî tiştêkî weha biqewvme, wê çaxê bila ew loma ji xwe bike, lê ji min neke.

Simko û Baçîn nêzflcî li malê kirine û ew ê bi qasekî din têkevin wê korîdorê.

50

ZEWAC

Saet li yanzdeh û nîvê şevê ye.

Ji nişka ve zengilê deriyê mala Biro lêdikeve. Biro û kewaniya xwe hêj rûniştî ne. Ji bo ku lêketina derî ducar nebe, Biro radibe ser xwe û ber bi dêrî diçe. Dema derî vedike, bi bejna xwe ya dirêj û porê xwe î nîvweşiyayî devê Lûtê ezeb li ken dibîne. Bêyî ku Lût deng bike, du sê caran serê xwe dileqîne û bi vî awayî dixwaze şevxweşiyê lê bike. Biro têdigêhêje. Lût derbasî hêla hundur dibe, bêdeng solên xwe ji lingên xwe dike û diçe li ser dîwançê rûdine. Bi devekî jihev li dora xwe dinêre û zûzûka wan hemî tiştên di odê de di ber çavên xwe re derbas dike. Dûre bi kêfxweşî dizivire ser Biro û kewaniya malê:

- Ma hûn nayên daweta min?

Li hemberî vê pirsê Lût, Biro û kewanî hew li hev dinêrin.

Ji ber ku ev hatina Lût ne wek hatina hertimî ye. Di vê derengiya şevê de hatina wî û vê pirsê wî, hîha rê ne daye xwediyan

51

malê ku xêrhatinekê lê bikin. Lê dema Lût dibîne ku bêdengî ye û bersiva pirsê wî ne hat, eniyê li xwe diqermeçîne û dibê:

- Ez bê henek dibêjim...

Bi rastî jî li bendî bersivê ye û bi vê liva xwe matmayîne

ji ser xwediyên malê hiltîne û loma kewanî bi pişîrîn dipirse:

- Ka daweta te kengî dibe?

Qermiçên h' eniya Lût wenda dibin, bi rûkenî destên xwe di hev re dide û dibê:

- Tiştê ku ez pê dizanim, divê ev havîha di ser min de derbas nebe. Icar bir rastîjî divê hûn werin. Ku hûn neyên, ma kî ê werin? Ez naxwazim ji herkesî re bibêjim û nabêjim jî... Na, na... çi hewce ye. Bi navê Xwedê ew ê min bihetikînin! Gerçî ez dizanim ku ev zewaca min, nîşana hetikîna min e. Lê...

Li vir mîna ku xwe ji tişteki serast bike, dibê:

- Ez bi heyrana we, min ji we re got lê hûn ji kesekî re nebêjin!

Tew ku zewaca min jî nebe, wê çaxê ez ê di nava xelkê de bibim xax welle! De îcar ev ji min kêmbû, ha!... Lê ez nabêjim nabe, dibe... ji sedê sed dibe. Ango ez dixwazim bibêjim ku çêbûna daweta min û zewaca min bêşik e û ez viya jî wek navê xwe dizanim... dizanim ku ev havîna ê di ser min de vala ne buhure. Lê dîsa jî divê hûn li ber herkesî devsiyê nekin!...

Lût serê xwe dbce ber xwe, eniya wî ya rût dest pê dike hêdî hêdî xwîdanê dide. Kewanî bi pirsek xwe serê wî j'i ber radike:

- Baş e, ka tu bi kê re dawetê dikî? Ma te çima berê ne digot?

Lût bi rewşeke matmayî berê xwe dide xwediyên malê, destê xwe bêmane li ba dike û dibê:

- Hi... De ca lê binêre! Ma berê, dawetkirina min li kuderê bû? Binêrin, min pêr dest bi karê zewaca xwe kir û ez işev jî pê bawer bûm ku zewaca min ê bibe. Loma min biryara xwe jî da ku ez dawetekê li dar bbdhim. Heta ku ez baş bi tişteki ewle nebim, ma ez belav dikim?

- TewL. min jî got qeyê ca ew ê bi rastî dawetê bike. Ma qet çêdibe! Di şevê de te çawa keçik dît, we bi çi awayî li 52

hev kir?L. Ma tew wusa dibe?

- Ê, na! Tu qet tiştêkî jî nizanî! Na, na. Hişê te di ber van tiştan de naçe. De ka hûn guhdar bikin, ez ji we re kat bikim... ez ji we re kat bikim ku...

Kewanî dîsa dikeve navînê û peyva wî di dêv de dibire:

- Na welle, keko... Ez tew bawer nakim ku ev zewaca te biçe serî. Ji ber ku ne mîna tiştêkî berçav be. Te hîna hesp ne haniye, tu afir çêdikî.

- Bi serê min û te, dibêjim ku tu bawer bikî. Ev zewaca min ê bibe û ez gelekî hêvîdar im ku ev payîza ê di ser min de vala neçe. De îcar we bawer kir!

Biro di ber xwe de dikene, kewanî bi pişirînek matmayî berê xwe dide Lût û dibê:

- Heta nuha te çêlî havînê dikir, lê anuha jî tu dibêjî, payîz.

Lût destê xwe li ba dike û:

- Anuha ne wexta lîstika li ser peyvikên havînê û payîzan e.

Çi havînê û çi payîz, herdu jî demsalên Xwedê ne. Lê ya girîng, li gor pîvana ku min kiriye, zewaca min ê di nêzîkê de bibe.

Naha tu bibêje çima û çawa?..

- Çawa?

- Ji ber ku ne bi yekî tenê re ye... Pênc keçê ji bo min têkevin rê. Ku yek nebe, ya din. Ewjî nebe, ya din. Ku ew jî nebe, ya din... Pênc keç in, pênc!

Bi van gotinên xwe yê dawî re, bi destê xwe dilopên xwîdana ser eniya xwe paqij dike. Ev peyv û rewşa Lût ewqas

tevlihev û ewqas ji nişka ve dibe ku bi rastî jî ji bilî henekan tiştekan nayê hişê merivan. Kewaniya malê di vê tevliheviya rewşa Lût de, hinek pirsên din jî dirijîne:

- Çima pênc keç, keko? îcar te ev pênc keç ji kuderê derxistin? Ku tu rastiyê bipirsî, ez tiştekanî têngêhîştim.

Vê carê jî Lût bi ken dibê:

- Ca lê binêrin, hîna têngêhîştîye!?!.. Ha, ha, ha!

Mîna ku kewanî bibêje: «Ma ev dikeve serê te?» li Biro dinêre.

Biro lêvên xwe bi hev de dişidîne û pê dixwaze bibêje:

«Na, ev ne tiştekanî ber bi aqilan e.» Lê ev rewîştên xwediyên malê ji ber çavên Lût nafilite û loma bi ken didomîne:

53

- Ha, ha, ha... rebeno... ew jî têngêhîştîye. Ez fam nakim ku hûn çima têngêhîjin. Lê wusa xuyaye... diyar e hûn naxwazin têngêhîjin. Ma ne tîpên Quranê ye ku ez bibêjim welle hûn ji hev dernaxin! Ser û binê wan pênc keç in. Ji her yeke wan re min wêneyekî xwe şandiye. Her pênc jî têne vir... Li vir Lût xwe bi quretî dide ser hev û didomîne.

- Lê ew ê neyên mala min. Ew ê werin malên merivên xwe. Ez ê jî bi kincên xwe yên xweşik biçim malên wan û em ê li wir hevdu bibînin. Ez merivekî şareza û demokrat im. Ku xwîna me li hev bikele, ma ew ê çima nebe?!.. Ez bi qurban, nebe nebe hûn ji kesekî re bibêjin, ha!... Lê ez nizanim ka ji bo malê çi pêwîst e. Gerçî ez îşev dûr û dirêj li ser fikirîm û min hinek pêwîstiyên malê nivisîne...

Bi van gotinên xwe re Lût destê xwe hêdfilca di bêrîka qutikê xwe de dike, perçekek kaxiza qermiçî jê derdixe, ber bi xwediyên malê dirêj dike û:



- Ca lê binêrin, dibê.

Ji destnivîsa wî ya xilûxwarî jî diyar e ku serê xwe di ber de êşandiye û lîsteyek tiştan h pey hev rêz kiriye.

Sê cot pêşgîrên serşokê bi 64 ...

Sê cot kevçî bi 12

Sê cot kasikên ferfûrî bi 36

Sê cot kêrên ... (peyvika vir nayê xwendin) bi 18 ...

Sê cot beroş bi 44 ... (di ser tevayîya vê rêzê re xetek hatiye kişandin, êdî ne ji van rêzikên lîstê ye)

Û di binê viya de jî gelek rêzikên weha dîsa bi «Sê cotan...» dane pey hev.

Piştî ku kaxiza qermiçî ji nav lepên xwediyên malê difilite û dikeve destê Lût, ew dîsa wê fena nivîstek pîrozwer tev dike û berdide ciyê berê. Ji bêtewatî destên xwe di hev re dide û dibê:

- Lê dîsa jî divê hûn yek bi yek navên hemî pêwîstiyên malê bi min bidine nivîsandin.

Kewanî:

- Erê erê, keko, dibê. Ku te zewaca xwe bi derekê ve girêdabe...  
54

- Erê, weh! Ma girêdayîn çi ye? Ez dibê min ev payîza ê di ser min de... Ez dibê min pênc wêne şandiye... ma hûn dizanin bê piştî min ji çi qewîn e? Aniha em bibêjin yek ne bû, ya duduyan ne xwest, ya sisiyan jî em bibêjin balafir ket û ew jî tê de mir... baş e! Lê ya çaran?... ya pêncan?... wehhh! Ma bextê min ê ewqas jî reş be!?..

Kewanî destê xwe davêje eniya xwe, lê bêyî ku bifikire vedigere ser Lût û dibê:

- Reng e, bûka me ê ji dûr... ji welatekî dûr were. Lewra tu çêlî balafirê dikî. Na xwe ji welêt tê?

Lêvên Lût li ser hev nahewin û bi dilekî şa dibê:

- Belê, bûkên we ê ji welêt werin.

- Ê tu çima wusa dibêjî, keko? «bûkên we!..» Ku ev ne henek be, bi rastî jî wan pir guneh in.

- Na welle dako, gunehê min bi wan nayê. Ka heta vî salê min gunehê kê bi min hatiye? Ya din, ma ev ne gunehkariye ku... Ji bo ku ez baş bi karê xwe ewle bim, min ev pênc rê bi kar hanîye. Ne ku ez bi her pêncan ve... uff! Ev zewaca jî çiqas merivan zimandirêj dike!..

Kewanî:

- Ma wan hay jê hene ku te ji hemiyar re jî wêneyên xwe şandiye?

- Na, na. Ma ez dîn im! Na dako, na. Ma çi hewce ye? Ji her yeke wan re... min wêneyên xwe yê cuda cuda şandiye. Di vî karê zewacê de jî divê bêhnêk polîtîkî ji meriv were.

Serqisê: Ji yekê re wêneyekî reşûsîpiyê ji navê, ji yeke din re dîsa ji navê lê rengîn, ji ya din re wêneyekî li ser lingan... û yê mayî nuha nayên bîra min. Çi bikim, wusa jî nebe, nabe!..

Lê ez bi gorî, hûn ji kesekî re nebêjin, ha!

Mereqdarîya jîniyê bi kewaniyê digirê û loma her bi şorgermî dibêje:

- Na, na. Em ê nebêjin. Baş e keko, lê j'i serxetê ne an jî bînxetê ne?

Mîna ku Lût bi devê xwe tiştê li xwe dayne, destê xwe li ba dike û dibê:

- De bi Xwedê ez jî nizanim. Tiştê ku ez pê dizanim: Min

ser û binê xetê tevlihevî kiriye ku ev zewaca min ji sedî sed bibe.

De qeyê ne gosirmeta giran e ku hîh jî nebe!

Lût tiliyên herdu destên xwe derbasî nav hev dike, di ciyê xwe de xwe hinekî bi paş de dide, mîha ku bibêje: «De herweha ev jiyana min ya ezebiyê jî qediya.» dizivire ser xwediyên malê û dibê:

- De ka we ne got? Hûn ê werin daweta min, ne?

Biroyê ku heta vê gavê wek keviyekî cirnexweş li wir rûnişti bû, bi zimanekî nermokî dibê:

- Na. Kêfa min j'i dawetan re nayê.

Bi vê gotina Biro re, ew payedariya zewaca ku bi qasekî berê li ruyê Lût bû, wenda dibe û di ciyê xwe de sar û matmayî dimîne. Lê dûre tavilê dizivire ser Biro û dibê:

- Ev çi bû, ezbenî? Ma ji bextê min re çima kêfa te ji dawetan re nayê! Mafir ku kêfa te ji dawetan re nayê, te çima heta nuha guhdariya min kir? Piştî ewqas guhdarkirina te, bi rastî jî ne li cî ye ku tu bibêjî: «Kêfa min ji dawetan re nayê.» Diviya bû te ev berê bigota... Lê dev jê ber de. Serê te û hatina te nexwe! Ji xwe tu hertim wusa yî! Tu mîha tavek bêtîh û nanekî bêxwê yî... Ne hewce ye, ezbenî. Bila yekî wek te jî ji daweta min kêm be, xem nake. Lê wê çaxê... mîna ku min got, divê tu ji kesekîre nebêjî...

Kelagirî li gewriya Lût dipiçike. Li welatekî biyanî, zewaca zava û bûkek bêkes tê ber çavên wî. Serê xwe di ber xwe de xwar dike, destê xwe davêje paş hustuyê xwe û dikeve ramanê. Piştî bêdengiyekê kurt, mîha ku li neheqiyekê varqilî be, serê xwe radike û ji Biro re dibê:

- Baş e, ma we daweta xwe çênekir!

Biro:

-Na.

Nola ku Lût ji Biro bawer ne kiri be, vê carê jî vedigere ser kewaniyê û dipirse:

- Ma bi rastîjî we daweta xwe ne kir?

Kewanî:

- Na welle, keko. Em li welêt zewucîn, lê...

Gwîhê Lût divemire, dîsa serê xwe dixê ber xwe, bêden-  
56

gîyê dikişîne serê xwe û di dilê xwe de weha dibê: «Ev rebenên ha jî nuha dibêjin, em zewucîne. Ma zewacek bê deng û bê şayî, bê tirş û goşt... Çi merivên reben hene, Xwedêyo! Li welêt zewucîne, lê... dawet çênekirine. Ku ev hişê min yê anuha li welêt di serê min de hebûya, min dizanî bû min ê dawetek çawa li dar bixista... We zingîha def û zirnê bixwesta, we xweşdengê bilûran bixwesta... ax! Lê hûn ê bibîhin, ez ê dawetek çawa li dar bbdhim! Bila ava wîskiyê wusa fena ava kaniyê biherike...»

Lê kewanî vê bédengiya wî lê belav dike û dibê:

- Baş e, keko. Bila daweta te bibe, ez ê werim.

Gwîhê Lût dîsa dibe wek yê berê, rûkenî li ruyê wî diyar dibe, radibe ser xwe ku êdî biçê. Lê ji nişka ve dizivire ser xwediyên malê û wê hevoka xwe ya îşevîn dicarîne:

- Ez be qurban, bila ev di navîna me de bimîne û kesek nebihîse!

Bi navê Xwedê ew ê gû di min bidin!

Xwediyên malê jî hêz didin xwe, di rabûna xwe de Biro dîsa bi wî zimanê xwe î nermîn û di ber xwe de dibê:

- Bi rastî jî ez têngêhîjim. Rast e, min daweta xwe çênekir, ez ne merivekî govend û dflanê me jî... Lê tiştê ku ez dizanim, zêdeyiya beşdarî dawetê xweştir û rengîntir dike. Lê ez bala xwe didim te, tu her dibêjî: «Bila kesek pê nizani be!»  
Ma tu ê dawetê bi kê ve çêbikî?

Dema Lût guhdariya van gotinên Biro dike, di dawiya her hevokê de serê xwe dihejîne û pê rastiya wan dipeyitîne. Dûre jî weha dibêje:

- Erê ezbenî, erê. Min ew tiştê jî çareser kiriye. Ma tu dizanî?... Beriya ku ez werim vir... Piştî ku ez ji malê derketim, min berê xwe da mala Bengiyan, ji wir çûm mala Berkenan... û Nesrîna jinebî jî li wir bû, li ser riya xwe min Seyîdxanê kulek û Siyabendê Serhedî dît û min ji wan re jî got... min ji wan re jî got ku bila di nava herkesê de belav nebe. Çi dibe çi nabe... ma ne wusa ye?

Beriya ku Lût xwe bigfliîhe ber dêrî, kewanî xwe pê re digfliîne û pirsê xwe ya dawîn dike:

- Ku wusa be, wê çaxê divê tu ji nuha de... Lewra karûba-  
57

rên dawetan ne tiştêkî asan e. Cî ye, mal e, kirîha ferûfolan e... çi dizanim hezar hûrûpizor hene ku...

Lût li ser lîngan bi livek wusa vedigere ser kewaniyê, mîna ku aniha bûkek delal li ser piştê hespê û li rasta hewşê li bendî wî be. Bi rûkeniyeke xewnên şevan peyva wê dibire û dibê:

- Belê belê, ne min got, hertişt çareser bûye. Karê ciyê dawetê, Siyaveşê me î fîfanî girtiye ser xwe, amadeyiya hemî xwarin û vexwarinê Zibêrê binxetî... Ciwamêro ji min re got: «Ev kara karê min e, yabo!» Û karê def û zirnê jî ewko... ez ê

bi mala mitriban re bipeyivim.

Li vir bawîşkeke bêwext tê Lût, zûzûka ber bi dêrî diçe,  
solên xwe bi ser Ungên xwe ve dike, serê xwe î porweşîn bi  
mebesta sevxweşiyê dîsa dileqîne û derdikeve. Derdikeve lê  
beriya ku derî li pey xwe bigirê, ew wî serê xwe î ku xwendevan  
pê dizane, dîsa di ber dêrî re dirêjî hundur dike û dibê:

- Ez bi gorî!.. hûn ji kesekî re nebêjin û bila belav nebe.

58

### ÇARŞEF

Ev taxa vî bajarî, ji avahî û kuçên xwe jî diyar e ku taxeke  
nû ye. Pênc sal beriya nuha, bi alîkariya kooperatîvekê û bi  
proja avahîzanekî biyanî hatiye çêkirin. Ku em zarokan nebêjin,  
hemû jinên bajêr bi rengê ne û mêr jî her yek bi babetekî  
ne. Di kuçên cejnerojan de ev babetên merivan  
dewlementir dibin, lê jin dîsa herwekî hev in.

Navnişanek li ser kaxizek nîvhelisî di destê Xêvo de ye, di  
kuçeke dirêj û fere de li pêşiya kewaniya xwe Zînê dimeşe.  
Piştî ku li xeraca nêzflcî vê taxê jî temafflê peya bûn, ev kuça  
şeşan e ku tê de dimeşin. Carina li kaxizê û carina jî li numeroyên  
ser deriyên hêla çep û rastên kuçê dinêre û diçe. Şalwarek  
lê ye, ji delingan teng û ber bi jor fere ye. Di ser wî de  
saqoyekî pîdirêj û fere di ser bejna xwe ya kin de berdaye.  
Şefqeyekî nû yê bi kuj daye ser serê xwe î piçûk û di ser tûlika  
xwe ya rûnkirî de xwar kiriye. Bi kurtî ji dûr ve wek bizmarekî  
dixuye. Bizamar jî, ne bizmarekî îngilîz an babetekî din, lê

59

rasterast nola bizmarekî di destê nalbendan de ye.

Nabe ku meriv wê Zîha li pey Xêvo binîgarîhe, lewra ji bilî

pîpikên wê yên di kortikên çavan de, ji lingan heta serê wê, reş nixumandî ye. Ango nivîskarekî bêfantasî ê ew weha binîgarta: «Ji dûr ve weke gagoleke rêxê dixuye.»

Li devereke kuçê, Xêvo li pey xwe dizivire ser vê kewaniya xwe û dibêje:

- Hevalekî gelek baş bû. Ji min çavekirîtir bû. Pirî caran dadiket xwarinxana leşgeriyê, kartolên xaşandî didizî û ji min re dihanî. Ji ber vê yekê jî min ew bi rengdêra femandariyê dinavand. Xwedêyo! Hevaltiya leşgeriyê çiqas bi rûmet e! Di rojên dawîn de sozên hevaltiyê, dozên biratiyê, danûstandinên heta mirinê... Meriv hertiştî dibêje, hertiştî... lê ev bû sal û nîvek, hêj me hevdu ne dîtiye. Ku anuha bizani be ez zewucîme û ez ê di nêzflc de bibim bav... ew ê pir kêfxweş bibe, ew ê ji kêfxweşiyê bifire!

Bi vê gotina wî ya dawîn re, Zîhê di binê çarşefê de herdu destên xwe dide binê zikê xwe î werimî, kesereke westiyanê vedide û li pey wî dibêje:

- Bi Xwedê ez nema dikarim bimeşim. Wusa xuyaye dergûş jî nerihet dibe.

Nerihetiya dergûşê li dilê Xêvo jî dixê û ji mêzekirina numeroyên ser deriyan, mîna ku wîjî hay ji westiyanê bû be. Loma li kewaniya xwe vedigerîne û:

- Ez dizanim, lê baştir e ku ez ji vî dikandarî bipirsim. Divê ew bizani be, dibêje û rasterast berê xwe dide deriyê dikana li ser piyê çepê.

Dikandarê ku pirtî ji hundur dikişande der û li pêş dikanê darde fikir, silava xêrhatinê lê hildide û:

- Fermo ezbenî, dibêje, we çi divêt? Li ba min ji her reng û

babetî fîstan hene; şîfon, lastflcotîn, hevrişîmê binxe...

- Bibexşe ezbenî, ma ev kuça ne kuça Xiyabana Xûb e?

- Belê ezbenî, belê.

- De baş e, lê ez ê çawa bi ser vê numeroyê ve bim?

Dikandarê bisal li numeroya ser kaxiza nîvhelisî dinêre,  
destê xwe davêje riyê xwe î dirêj, bêhêvî ber bi jêr dinêre û:

60

- Ezbenî, dibêje, ez baş ne ewle me... lê ez bawer im numeroya  
57'an ê li jêra kuçê bikeve.

Xêvo:

- Mala te ava, ezbanî! dibêje, lê çavê wî her li kewaniya  
xwe û rewşa wê ye. Gelek baş e ku dikandarê bisal têdigêhîje  
ku kewaniya bi wî re westiyaye. Çêyiyekê dike, vedigere ser  
Xêvo û jê re dibêje:

- Ku bûk westiyayî be, heta ku tu diçî û navnîşanê dibînî,  
bila ew li vir di dikanê de westa xwe bigirê.

Xêvo û kewaniya xwe, herdu jî ji vê pêşniyarê kêfxweş dibin.

Herweha jinik dikeve hundurê dikanê ku westa xwe bigirê  
û Xêvo jî di Xiyabana Xûb de serjêr dibe.

Piştî pirsîna ji du sê kesên din, Xêvo deriyê 57 numeroyî  
dibîne. Ev deriya jî nola hemî deriyên vê taxê duperdeyî û  
wek pirî wan bi rengê kesk e. Ji bilî numero û loqên li ser  
deriyan, cudayiyêke piçûk jî di navbera wan de tune. Bi gavên  
dilpekîh tê ber vî deriyê hewşê. Di wextek pir û pir kurt de,  
ew hemî demên leşgeriya ku bi hev re buhurandi bûn, têne  
ber çavên wî û ji nişka ve du sê cara bi loqê dêrî lê dide.

Derî vedibe, herdu heval çav li hev dikevin û heta demeke  
kurt jî weha bê axaftin li hev dipiçikin. Car bi car piyên xwe ji



milên hev sist dikin, li hev dinêrin û dîsa xwe bi hev ve dişidînin.  
Dûre peyvên heyfa dûrketinê, xêrhatin û xweşiyê li hev  
dibarînin.

- Wey, tu bi xêr hatî!... Tu ser çavê min re hatî... tu û van  
derina! Xwedêyo! Ez bi çavên xwe bawer nakim! De kerem  
ke, were hundur. Diya min jî li mal e...

Xêvo bi çavên avî li hevalê xwe vedigerîne û dibêje:

- Na, fermandarê min... divê ez bi te bidim zanîh ku... ez  
ne bi tenê me.

Fermandar serê xwe di ber derî re dirêjî kuçê dike ku bibîne  
ka kî pê re ye.

Lê piştî Xêvo pê dide zanîh ku wî jina xwe li dikana serê  
kuçê hiştiye, herdu hevalbend ji ber deriyê hewşê dûrdikevin  
û bi hev re ber bi dikanê dimeşin. Ji kêfxweşiya hevdîtinê, fermandar  
ji bîr dike ku diya xwe jî ji hatina mêvanan haydar bi-

61

ke. Di rê de hevalbendên kevn carina li hev vedigerin, çêlî  
demên leşgeriyê dikin û bi hev dikenin:

- Wey, tu ser çavê min re hatî! Malavawo, ma bextê me  
weha bû! Ha, ha, ha... Bi rastî jî min tew ne dipa. Lê diyar e,  
te ez ji bîf ne kirime. Bila mêraniyeke te bi ser min keti be! Bi  
rastî tu ji min mêtir derketî, ne wusa?

- Tew nebêje, fermandarê min! Heta ku ez bi ser mala we  
ve bûm, çavên min rijyan.

- Te zehmetî kişand, ne wusa?

- Ma zehmetî jî gotin e, fermandarê min! Kewaniya min ji  
çogan de ket! Li vî xaniyê dinêrim, fena yê din e, li yê din dinêrim...  
mala wan ne avaL. hemî jî nola hev ava kirine. Ji xêra

hinek darûberên li hewşan, an jî ji numeroyan meriv dikane ji hev dendhe. An ne... bi navê Xwedê gelek û gelek çetin e ku meriv ji hev binase. Ez dibêm nuha pirî caran hûn rûniştevanên vê taxê jî, bi çewtî diçin ber deriyên cîfanan. Ha, ha, ha!...

Fermendar şorgermiya bi hevalê xwe î kevn ve didomîne û dibêje:

- Tu dev ji hertiştî berde, lê bi rastî jî tu êdî pîr bûye, ezbenî.  
- Êê... ne tiştêkî asan e, fermendarê min. Ev zewac e! Di nêzflc de jî ez ê bibim bav. Beriya ku ez ji bîf bikim... Ji ber ku di van demên dawîn de ez pir xwejbîr bûme... ku law be, ez ê bi navê te banî wî bikim.

Bi galegalên weha hevalbendan nêzflcî li dikana pirtiyên kirine. Xêvo herdu çavên xwe bi hev de dişidîne, bi çavekî diyînê dinêre û:

- Binêre, dibê, kewaniya min li ber wê dikanê ye.

Kewaniyek di nava çarşefeke reş de, li ber pirtiyên pêş dikanê rawestiyaye û yek bi yek lê dinêrî. Gelek kêfa Xêvo jî bi vê liva kewaniyê tê. Loma vedigere ser fermendarê xwe û:

- Kewaniya min koçer e, lê koçereke ji malmezinan e. Têgêhî ştiya serlêdanên wusa ye. Ez bawer im, dixwaze ji diya te re fîstanekî diyariyê bikire. Lewra min pir jê re qala diya te kiriye... û min jê re gotiye: «Bi namên fermandêr re gelek si-

62  
lav ji me re dişand, ji me re nokên qelandî dişand...» ji me re nivişt jî şandi bû, ne wusa fermendar?

- Erê ezbenî... baş e, em zû lingên xwe rakin, bila bûka nû nekeve nerihetiyê wusa...

Xêvo zûzûka:

- Na, bi navê Xwedê nabe! dibêje û peyva ferman dê dibire.

Baş e ku ew fikiriye, an ne, ma sergêjekî nola min ê çawa

fikra tiştêkî wusa bikira?

Herdu hevalbend xwe digfliînin ber dikanê. Lê ji bo ku kewanî

fîstaneke bi dilê xwe bikire, hinekî ji dikanê dûr radiwestin.

Hundurê dikanê ji merivan dagirtîye.

Gelek nabuhure, kewaniya bi çarşef fîstaneke lastflcotîh î bi

kulflkên hûr girtiye destê xwe û bi çavekî kirîne lê dinêre. Xêvoyê

ku fikra westiyana kewaniya xwe û dergûşa di zikê wê de

dikir, ji ber ferman dê xwe dipengize, bi gavên lez diçe ba

wê, beriya ku bibêj'e: Min mala hevalê xwe derxist û em bi

hev re hatin:

- Bi Xwedê, dibêje, ev î di dest te de çêtirîn e. Ji bo pîfejina

diya hevalê min, ev gelek baş e.

Kewaniya bi çarşef, berê wusa têdigêhîje ku xwediyê dikanê

ye ew. Loma di ber xwe de bi dengekî nizm û nîvçe:

- Rast e, dibê û dixwaze li yekî din binêre.

Lê Xêvo her di ser de dike pilepil:

- E erê, koçera min! Ev î bi kulîlkên hûrik pir xweş li jinên

pîr tê... de hinekî lez bike!... hevalê min dipê.

Bi van gotinan re, di binê çarşefê de xwîdanek sar li kewaniyê

dide der. Lê ne berê xwe dide Xêvo û ne jî deng dike. Bi

qasî kişandina çend hilmên cixarê, wext dibuhure. Xêvo li kêleka

kewaniyê, li ber rêza fîstanên dardekirî sekiniye. Tewatî

nakeviyê, carina di ber xwe de tiştina dibêje, destê xwe davêje

fîstanan û pê dilîze, vedigere li ferman dê xwe dinêre û ji bo

ku li hemberî wî zêdetir şermesar dernekeve, Xêvo peyvên

xwe yê bi kewaniyê re didomîne û:

- De zû xweşik min! Hevalê min ê nuha bibêje: Ev jina wî jî çî jineke destgiran e!... dibêje û bi van gotinên xwe re destê xwe hêdîka davêje milê kewaniyê ku bibêje: Hinekî lez, lez  
63

lez!

Lê pêre nagfliîne van gotinên xwe yê dawîn bibêje. Lewra heta wê çaxê, bi vê liva Xêvo re jinik xwe vedikişîne, hewarek pê dikeve, vedigere ser Xêvo û çî tê ber devê wê jê re dibêje:

- Tu şerm nakî, beşeref! Rêsiyek simbêl li ber pozê te ye, riswa! Ez di dewsa diya te de me, ne!... ma tu ji xwe şerm nakî ku tu li ber çavên ewqas kesan, li vê rasta kuçê destê xwe davêjî...

Bi vê hêrsa jinikê re dest û pî li ba dibin, çarşefa serçavê wê dişemite xwarê, seriyekî bi porê şînbozî û ruyekî qermiçî derdikeve rastê. Bi deng û hewara wê re, tev kewaniya Xêvo û dikandarê bisal, çend kesên din jî di devê deriyê dikanê de ber bi çavên Xêvo dikevin.

64

## KULTUR

Jinebiyeke xwedîxwendina bilind bû, Zîvyayeva.

Lê bi xwe ne xweşik û ne jî lihevhatî bû. Ji dûr û nêzflc ve jî baş dixuya ku pirça zer û reş li ser lêva wê ya jorîn, mîha berzikek rûçikî xirab xirab diponije. Firnikên pozê wê fena devê şikeftên çiyayên xalî reştarî dbcuyan. Ku ji pêsîf û tilorên wê yê bi xesrew jî ne bûya, meriv ê biketa şika jinitiya wê. Ev deverên wê yê xirab, mîha ku bi destên peykertiraşên Venus hati bin çêkirin. Bi kurtî dirûvên jinên barflc û narîn qet pê ne

diket.

Ji hêla din ve jî, Zîvyayeva xwediyê du zik zarok û dilbijoka bejnûbala jinên nazdar û nexweşa tevgera wan bû. Carina ev rastiya dilê xwe, bi devê xwe li xwe dadihanî û xwe bi xwe: «Heye ku ew ê êdî sipehîbûna min tune be, lê divê ez bi kêmanî ji hêla kulturê de xwe serast bikim da ku bala hinekan bikêşim.» digot, diramiya û bi vî awayî kunek ava sar li ser dilê xwe direşand.

65

Lê tew Xwedê nekira ku yekîjê re bigota: «Zîvyayeva xwedî kultureke bilind e.» an jî wê gotineke wusa bibîhîsiya, wê çaxê bextiyariya wê ê bêpîvan bibûya û ew ê ji kêfxweşiyê bifiriya. Elîzabeta cîrana wê, bi têra xwe rindbûn û kultur ji welatê xwe î Amerflcayê hanî bû. Porzer, kej, çavşîn, devliken, bejinzirav, giran û bi her awayî lihevhatî bû. Ji bilî zimanê xwe û wê: almanî, fransî û erebî dizanî bû. Xwe bipêça jî û xwe şilfûtazî jî bikira, li wê dihat. Zîvyayevayê ji hêlekê ve ji bedewbûna cîfana xwe ya Elîzabetê xwî dikir, ji hêla din ve bi qalkirina kultura wê, xwe jî dikir xwedîpar û di dilê xwe de banî Xwedî dikir. Lê mixabin, ku Xwedê jî bihata û ji nû ve dest bi çêkirina Zîvyayevayê bikira, ew ê: bi xwe jî ji nav vê xilûxwariya wê derneketa.

Zîvyayevayê bi destên xwe çepik lêxist û kete hundur. Dilge şî û dilreşiya wê tevlihev bû bû, berî xwe da lawên xwe yên berzewac û got:

- Lawo zû rabin ser xwe, van derina bidine hev, bi qasekî din Elîzabeta cîrana me ê were mala me. Kûpa kulturê ye, Elîzabet! Xwedêyo!... Ma hûn nizanin bê ez çiqasî ji wê jinikê

hez dikim! Ku li dunyayê yeke xwedî kultureke herî bilind hebe, ew jî Elîzabeta cîrana me ye. De... zû lez bikin! Destên xwe tev bidin!... De bila dengê min bête te, Semîhov! Aniha ne wexta xwendina pirtûkê ye!

Semînovê berzewac hêdî hêdî rabû ser xwe, pirtûka di destê xwe de danî hêlekê û bi hundurê odê ketin. Palasên xwe raxistin, oda rûniştinê damiştin, kasikên ferfûriyên qehwê amade kirin... Ji kêfxweşi dest û ling li Zîvyayevayê dilerizîn, tewatîyê ne digirt, bi vir û wir de dibezîya... Xwarinçêkirin kete bîfa wê, zivirî ser lawê xwe yê piçûk î çardehsale û gotê: - Babflovskî, tu lingên we rake û zû biçe tiştên xwarinê bîne, em ji cîrana xwe ya Elîzabetê re permêwikan dagirên. Bila xatûna me, bi kultura me jî bizani be. Bila nebêje qeyê em bêkultûr in...

Piştî du saetan qahwe hati bû vexwarin û bi Elîzabetê re li ser kulturê dûr û dirêj hati bû peyivîh. Weke hertim Zîvyayeva

66

li vir jî zêdetir peyivî bû. Serê textê xwarinê bi selete, permêwik, dew û bi hinek xwarin û şînayiyên din hati bû xemilandin. Zîvyayeva bi herdu lawên xwe yên berzewac û Elîzabeta cîrana xwe ya kûpa kulturê re, li dor textê xwarinê rûnişti bû. Bi şîngîna çetel û namkiyên ferfûrî re, kêfxweşiya wê zêdetir bû bû. U bi yeke wek Elîzabetê re jî nanxwarin, ji bo wê serbilindiyeke mezin bû. Bêhemdî bûya jî, çavên berzewacan li hin devernê kûpa kulturê diketin û herweha ewjî ji ya xwe ne diman.

Civata li dora textê xwarinê, herkesî ji bo xwe namkiyên xwe ji xwarinê dagirti bûn. Namkiyên berzewacan û ya diya

wan weke hertim li ser masê bûn. Lê Elîzabetê, li ser çoga xwe, ya xwe girti bû destê xwe î çepê, bi destê din jî çetel bi baqilî di permêwikan de çik dikir û bi kubarî di devê xwe de dadihanî.

Bala Zîvyayevayê her li Elîzabetê bû. Dema ku çav li vê nanxwarina wê xist, bêyî ku li ser bifikire wê jî rahişt namkiya xwe û danî ser çoga xwe. Ji sitûr û kinbûyina çîpên xwe, zû diqurimî. Serî gavê lingê xwe î çepê davêt ser yê rastê û yê rastê davêt ser yê çepê. Di navîha sê çar deqan de, wê çar pênc caran çîpên xwe diguherand û li hev siwar dikirin. Ji xwîdana ser pozê wê î wek qaşikê potqalê jî xuya bû ku ev rewşa ha, bi wê dijwar bû. Lê dîsa jî bi serhişkî ber xwe dida. Di bin çavan re li dest û lepên Elîzabetê dinêrî, dûre çetelê xwe bi tirs di permêwikan de çik dikir û hêdî hêdî di devê xwe de dadihanî. Ev hemî ji bo nanxwarineke bi yeke mîna Elîzabetê re bû.

Bi baldarî dixwar û di ber re jî li ser kulturê dipeyvî:

- Tu dizanî, Elîzabet, kultura me kultureke kevn e. Gelekî kevn e. Dema ku ez dibêjim kevn e, ango ne xirab e. Gerçî gelek hêlên kultura me nayête parastin... Lewra îro êdî li welatên rojava piçekî seyr e. Ê em dikarin bibêjin ku gelekî seyr e. Serqisê em kultura şîv û şîvxwarinê bidin ber çavan. Li ba me, mêr xwarinê çênakin. «Ew karê jinan e.» dibêjin. Êjinên me yên bêkultur jî... ango ew jinên me yên ku ji kultura hêla we bêpar in jî, bi hustuxwarî xwarinê çêdikin. Lê ji pîrekên

67  
me, hinekan mîna min xwendine û haya wan ji kultura her quncikên dinê hene. Ê li ser mijara kulturê dikarin devê mêrên xwe biqelişînin. Welle hinekên wusa çavekirî hene ku mêrên

xwe tî dibin ser avê û dîsa tî tînin...

Elîzabetê ev meteloka fam ne kir. Bi pişirîneke şêrîn û dengê zirav pirsî:

- Çima tî dibin û tî tîhin?

Bi vê pirsê kûpa kulturê re kenekî seyr bi Zîvyayevayê girt, bi destê xwe î wek carût du sê caran piştê Elîzabetê mist da û got:

- Wey Xwedê xatûna min bihêle! Ma... tu hîna nizanî bê «Tî birin û tî hanîn» tê çî manê? Ango mêrên wan tew nikarin bikin fîq!

Elîzabetê ev peyva argo çewt fam kiri bû, an jî dîsa têngêhîştî bû. Loma her bi çavekî pirsok dinêrî. Mîna ku Zîvyayeva bixwaze vê peyva xwe serast bike û pê bide famkirin, vê carê devê xwe bi hev de şidand û got:

- «Fîq?..» Ango mêr nikanin li ber wan bibêjin, kirt! Û ez dikanim ji xatûna xwe re bibêjim ku li hemberî jinên me yên wusa, gelek doxînsistan hustuyê xwe jîxurandine.

Elîzabetê êdî pirs ne pirsîn. Wê ev hemî têngêhîştina xwe jî mîna permêwikan, bêdeng di nava xwe de nixumand. Semînov hay jê hebû ku diya wî gelek tiştên erzan û vala digotin.

Lê wî jî ji bilî xwarina permêwikan û carina jî nêhirîna li Elîzabetê, tew deng ne dikir. Bêyî ku guh bide kûpa kulturê, Zîvyayevayê peyivîna xwe ya li ser kulturê didomand:

- Elîzabeta xatûn, ma tu nizanî bê ez çiqasî ji te û kultura we rojavayîyan hez dikim! Lê li ba me her jinên dê û bavê xwe, van tiştên ku ez dibêjim fam nakin... têngêhîjin. Ji bilî şorbe û xwarinên ron, tu bawer neke ku kevçî bi kar tîhin. A, xwarinên mîna permêwikên wusa jî, bi lepên xwe dixwin.



Welle, ku tu çetel bidî dest wan, ew nizanin pê bixwin. Ew ê lêvên xwe qul bikin, an jî namkiya ber xwe biqelibînin û di ser te de birijînin. Ha, ha, ha!...

Ji dengê kenê Zîvyayevayê hundurê eywanê disincirî. Elîzabetê bi pişirîn hevaltiya kenê wê dikir. Di vê qisedanê de  
68

Zîvyayevayê hay ji xwe tune bû û Xwedê dizane bê çawa xwarin xwari bû. Lê qeşûqola dora devê wê û ew bilçikên dewê sipiyê li ser pirça lêva wê ya jorîh, li ber çavan bûn. Piştî van peyvên wê, dîsa kultura Elîzabetê kete bîra wê, tevayiya bala xwe da ser tevger û nanxwarina wê. Çetelê xwe hêdfilca bir ser piştta permêwika pêçayî, tê de çik kir, mîna kûpa kulturê wê jî xwest bêyî ku lêvên xwe pê bike di devê xwe de dayne. Lê mixabin, ji şeytanî re loqê permêwika reben ne xwest têkeve devê wê î gir û jihev, mîna mişkekî ji dev pisikê bifilite ji dêv de hate xwarê, di ser sîng û xirabciyan re gêr bû û heta ber lingê lawê wê î Semînov çû. Rebenê du sê caran jî destê xwe li pey havêtê ku kûpa kulturê nebîne û li wê negirê. Lê heta wê çaxê namkiya di dest de xwar bû bû û sê permêwikên din jî ji namkiyê reviya bûn. Çavên Elîzabetê ev rewşa dît û bi pişirînek hertimî li xwîdana ser pozê Zîvyayevayê nêhirî. Ew mijara ku bi gavekî berê li ser peyivî bû, zûzûka di ber çavên Zîvyayevayê re derbas bû û bi dilverişîn li cîrana xwe nêhirî.

Semînov di bin çavan re li çîpên Elîzabetê, li diya xwe û ruyê wê î sorbûyî û li permêwikên gêrbûyî nêhirî, serê xwe xiste ber xwe, êdî kenê xwe ne girt û ji nişka ve berda. Hflc, hîk, hîk!...

Di pey hîkehflca kenê Semînov re, ji bilî dengê çetel û

namkiyên ferfûrî tiştekan ne dihat bihîstin. Xwarin hate xwarin, textê nênan hate paqijkirin, qehweyek din jî bi ser de hate vexwarin...

Lê Zîvyayeva her bêdeng bû û diponijî. Wek berê qala kulturê ne dikir. Mîha ku ji kezeba xwe, ji lawên xwe û ji kûpa kulturê xeyidî be. Ev ponijîna wê ya bi mirûzekî tirş û tal, ew bêtir çist dikir.

Elîzabetê destûra çûyîna xwe xwest, gelek sipasiyên xwe li Zîvyayevayê kir, «Hûn jî werin û biçin, kultura me ji hev ciyê be jî em cîranên hev in, em ê ji hev fam bikin û bibin alflcariya hev.» got û ber bi dêrî çû. Zîvyayeva bêdil ji ciyê xwe rabû, bi rewşeke xemgîn û westiyayî heta ber dêrî da pey kûpa kulturê. Dema ku Zîvyayeva ji ber derî zivirî, dest pê kir:

- Ev Elîzabeta jî çî jinikek bêkultur e! Min jî digot ka çî jin

69

e!? Tew... Xweliya min li serê xelkê be ku ew jî dibêjin em jin in... û jinên xwedî kultur... Bi qurbana navê kulturê bin! Xelk çima wusa ne, Xwedêyo! Ji derve de meriv dibê qeyê kultur ji dawa wan de direşe û hertişt ew in. Lê ku meriv carekê bi wan re rûdine, dibîhe ku hertiştên vikûvala ne... Bejneke vala, zimanekî westiyayî, seriyekî gêj, rindbûnek... de ew rindbûna jî rindbûn bûya! Kî fena wan xwe şilfûtazî bike...

Zîvyayevayê ji nişka ve peyvên xwe birî, vegeriya ser zarokên xwe û got:

- Binêrin, berxên min! Ez Hizanim ku hûn baqil, zane û xwedî... lê dîsa jî divê ez we li ser tiştekan haydar bikim ku tu carîbi rindbûna jinan nexapin, ha!...

Semînov di bin çavan re li diya xwe nêhirî û dîsa bi hîkehflc keniya. Hêrsa Zîvyayevayê duqat bû û di ser de kire qîf:

- Nola jinên xirab, tu çi dikenî?! Tu li ber wê Elîzabeta fahşek jî wusa dikeniyay... Min hayji te hebû...

Semînov:

- E, ma çi hewce ye tu jî namkiya xwe mîha wê didî ser çogên xwe, pariyê xwe li gor wê dbd devê xwe? Ma em bi diya xwe nizanin?...

- Tu jî çêlrûtiya neke, pirço! Çima... ma we jî ne dît... we jî ne dît bê çi jinikek fahş bû? Navê kulturê li ba wê jinekê tune bû. Na, qet! Min ne dît...

- Dako, welle cirkflca ku min çavê xwe vekiriye... bibore lê, tu her wusa bêxwê yî. Ku tu rika xwe li yekê girêdî, heta ku ji destê te were, tu ê wê xirab bikî. Ez ji berê de bi vî xwiye te dizanim. Bila te jî rojekê li gor xwe peyv bikira... Ma kevir ê ji asimanan de bihata xwarê?... Hflc, hflc, hflc!...

- Ka tu carê li wê pirça derûdora hustuyê xwe binêre, dûre bipeyive! PirçL.

Mîna ku Semînov bixwaze diya xwe bêtir hêrs bike, peyv di devê wê de birî û got:

- De qeyê ez jî ji te çêbûme. Lê qene ez mêr im... hflc, hflc, hflc...

Zîvyayevayê çav li dora xwe gerand ku tiştek bi dest keve û pê li serê Semînov bbdhe. Babflovskiyê ku nêhirî rewş xirab e,  
70

bi zimanekî nermîh kete navîhê û got:

- Ma tu çima xwe cUqaliirîhî, dayê? Te bi xwe hat got: «Cîrana me, kûpa kulturê...» Lê ez aniha baştir têdigêhîjim ku çima bavê min ji te ciyê bûye.

- De rabe ser xwe tu jî!... Ma min bêhna bêçiya xwe kiri

bû? Te bi xwe jî ne dît! Ji bona Xwedê, çilka kulturê bi wê jinikê re tune bû. Navê kulturê pê keti bû û hew!..

71

ANONS

Piştî anonsa xwe nameyek kete destê wî, weke bersiv wî jî nameyek bi pêjnên evîndariyeke xurt bi rê kir û li gor gotinên wan yên di namê de, bi qasekî din jinik ê bihata mala wî. Karûbarên xwarina bi jinekê re hati bû kirin. Tiştê ku di vê gavê de bihata kirin; rastkirina masa xwarinê, tevkirina kinc û berhevkirina tiştên li ser dîwançê, sandalî û masa nivisînê bû. Lê kêfxweşiya hevdiîtina wî û jineke nenas an jî nû, dest û lingên wî li hev gerandi bû. Lewra dema dixwest ku beroşa xwarina germ bîne û li ser masê dayne, destik ji bîr dikir û heta ku lepê wî neşewutiya bi xwe ne dihesiya. An jî di dagirtina piyala şerabê de xwe ji bîr dikir, ew heta nîvî vedixwar, ji nama jinikê hevokek dihanîbîra xwe: «Ji bo vexwarina jin û mêrekî, piyalek tenê têr dike.» Dûre li wê hêla masê cî dida wê piyala nîvçe, di dilê xwe de: «Xuyaye jineke romantîc e.» digot, ji ber masa xwarinê diçû ber pencerê, bi çavekî bendewar li derve dinêrî, avdana kulflkên pencerê diket bîra wî,

72

diçû ku avê bîne, lê li wir bi tiştêkî din mijûl dibû û venedigeriya. Serxweşî, bêbiryarî, giraniya hêvîdarî û tevliheviyekê girti bû ser laşê wî.

Ji nişka ve zengilê deriyê wî lêket. Bi deng re, we ew rewşa wî bidîta! Dilpekiyeke bextiyar li ruyê wî dabû der, bi pişirîn ber bi dêrî çû û zûzûka vekir.

Jineke barîc bû. Bejinzirav, çavşîh, kej û ciwan bû. Di nava

kincên xwe yê sipî de, rengê wan jinên di evînromanana de dida. Bi silavên germ bergitî hev bûn, xêrhatin û xweşî li hev kirin û jinik bi kerem derbasî hêla hundur bû. Di devê dêrî de weke pelapîtkekê kûvî kûvî li ba diket. Lê Bedran ew dabû pêş û wî jî li paş carina destê xwe li vê hêlê û li wê hêlê li ba dikir, û ji wî wetrê ciyekî rûniştinê rayê jinikê dide. Di ber re jî dipeyvî û:

- Bibore, jiyana... jiyana merivekî bê jin, wek ku Xwedê jî pê dizane j'i herkesî ve xuyaye, got û xwarî şekalên li ber devê derî bû, ew rast kirin, bêyî ku li ruyê jinikê binêre dîsa destê xwe ber bi oda rûniştinê kir û domand:

- De... fermo! Kerem bike, tu danîşe... ez...

Li ser dîwançê çavên wî bi derpê û kirasê wî yê vacabûyî ket, zûzûka çû ew rakir, dewusand kefa destê xwe û ber bi deriyê serşokê çû. Piştî ku di serşokê de jî tiştên li ber lingan da ser hev, rabû di neynikê de li xwe nêhirî, hinek lewante jî di xwe da û derket. Jinik di dîwançê de rûniştî bû, li diwarên hundur, U pirtûkxanê, U Incfl û çend kaxizên ser masa nivîsê û U nînogên tiUyên xwe dinêrî. Bedran bi pişirîn ber bi dîwançê hat û U ser Ungan:

- Tu bi xêr hatî, xatûnxa, got. Hêvîdar im tu ê jiyana min ya li ber Ungan, U min negirê. Tu bi xwe jî dizanî ku rengê jiyaneke bi rêkûpêk, bi jinê dibe. Ewjî di vê malê de tune, ez çî bikim! Ya rastî min jin hebû, ne ku tune bû. Lê... lê em nuha dev ji van tiştan berdî. Min xwarinek çêkiriye, tu fermo em bi hev re bixwin.

Bi vê gotina xwe re destê xwe dirêjî jinikê kir, du dest bi evîneke germ bi hev bûn û bi hev re ber bi masa xwarinê çûn.

Bedran jinik U hêleke masê da rûniştandin, kir ku ew jî U

73

pêşberî wê rûne û dest pê bike, lê dît ku gelek tişt ji ser masê kêmin. Bi şermesarî serê xwe U ba kir, ber bi ciyê kêr û kevçiyar çû, di vegeerê de ew gotinên piştiku U ya xwe carand û got:

- Tu dibînî... tu dibînî malek bê bermalî çawa mêrekî gêj dike, ne wusa? Lê divê tu U min negirê.

Jinik bi pişirîn û dengê jineke barflc:

- Tew xem nake. Ez te fam dikim. Ji xwe di nama te de jî min tê dendsti bû. Ji bo min jî hevlekî îdeal pêwîst e. Li gor min jiyaneke îdeal jî bi jin û mêrekî îdeal pêk tê.

Ev peyvên bi vî dengî, dilê Bedran ewqas xweş ewqas xweş kiri bû ku tavilê pişirînek U ruyê wî xuya bû û dest pê kir:

- Te qala namê kir... çer ku min nama te xwend, ez têngêhîştim ku bi destê jineke nadîde hatiye nivisîn. Bi rastî jî ew peyvik û hevokên ku te U pey hev rêz kiri bûn, ne karê her jinekê ye. Dema min xwend pêjnên helbestvanîyê U min rabûn.

Min kir ku ez... Ez pir ji tiştên wusa hez dikim. De fermo tu kerem bike, ji xwe re xwarinê bikêşe ber xwe. Ax, ax!...

Jinika nadîde bi pişirînên serê lêvan ji hêlekê ve xwarin dikê şand ser namkiya xwe û ji hêlekê ve jî U Bedranê çavreş dinêrî, gelek pirsên sergirtî di serê wê de di Uviyan û di dilê xwe de digot: «Xortekî dilovan û dilpak e. Lihevhatî ye. Lê çi karî dike? Qala jinekê kir lê nîvçe hişt û kat ne kir.» Bi xwarin û vexwarinê re jinikê pirsên xwe yê sergirtî hêdî hêdî dipirsî û bi Bedran re U ser dipeyivî.

Di piyalekê de tenê vedixwarin û carina jî bi hev dikenyan.

Piştî nîv saetekî serî U herduyan jî germ bû bû, şprgermî,

henek û tinaz jî U ser masa wan xuya dibû. Mîna ku ji berê de hevdu dinasin. Peyva şerm û biyanî ji ferhenga masa wan derketi bû. Lê U derekê mîha ku keti bin galegalên mijareke girîng, bi bal û bi giramî dipeyivîn. Jinikê weha digot:

- Binêre, canekem. Tu bi xwe merivekî oldar, dilpak û dilovan î. Lê dîtînen te yên U ser jinan, bi rastîjîxirab in...

- Rast e, xirab in... Ez dizanim xirab in. Lê ev ne dîtînen min in... rastiya jinê wusa ye.

- Binêre, çewtiya te ya pêşîn ev e ku tu jinê tiştêkî U derveyî civatê dibînî. Ya din, çima kêmasî û kêmaqiUya mêrekî  
74

nayê hişê te? Ya herî girîng jî... divê tu jinên çê û xirab ji hev cuda bikî.

Bedran rahişt piyalê, şûşe di ser de vala kir, piştî ku qultek di gewriya xwe de berda û bi milçîha devê xwe tam dayê, piyal ber bi jînikê kir, destên xwe bi herdu hêlan de vegirt û got:

- Ez têngêhîjim. Jin bi çêyî û xirabiya xwe jin e. De ka tu ji min re bibêje, jineke çê bi çi awayî ye.

Mîna ku jînik hinekî enirî be:

- Ku tu bixwazî tenê U ser doxma jinê bisekinî, tiştê ku ez ji te re bibêjim, tune. Divê meriv bi her awayî tevayiya jinê vejîne, ne hêleke wê.

Bedran serê xwe kiri bû ber xwe, guhdariya wê fikir û di dilê xwe de: «Baş e ku we doxînsistî U xwe danî.» got û bi pişîrîn berê xwe bi jînikê de kir û dîtînen xwe domand:

- Na, canekem. Ez çêtf doxînsistiya wan nakim. Divê jin hay ji jînitîya xwe hebe û di her demê de rola xwe ya civakî bide xuyakirin, lê mixabin...

Jinik hêrs bû bû, loma peyva Bedran birî û got:

- Lê mixabin... ev dîtinên tê... ramanê ramanwerên welatekî paşketî ye. Lewra di roja îroyîn de gelek dijwar e ku yek U welatên weha şareza rabe û bi vî ramanên te bijî.

Vê carê jî Bedran bi enirîh berê xwe bi jinekê de kir û got:

- Binêre, jinika welatê şareza! Tiştê ku ez dixwazim bibêjim, ne pirsgerêkeke rqa îroyîh e, ne pirsê welatekî pêş û paşketî ye. Ez dibêm, dîfoka jinê bi rûpelên qirêj dagirtî ye.

Vegere û biçe ser çêbûna meriv. Bi Hewa û Adem dest pê kir, ne wusa? Hewa xatûn ne doxînsist bû, rast e. Lê şeytanek radibe wê dixapîne, bi sêvekê dixape... û ev yeka dibe sedema mirovatiya U ruyê dunyayê û em jî îfo dixwînin, dibînin û dijîn, berxika min! Tu nikarî bibêjî: «Bila tevayiya merivan tazî bigerin. Tişteki xwe ji hev veneşêrin. Bila bi ya dilê xwe bikin. Çi dikin bila bikin.» Civaka dîfokê ne civaka îroyîn e! Di roja îfoyîn de jî... Dibe ku ez guhê xwe bbcetimînim û tişteki nebihîsim, çavên xwe derxim û tişteki nebînim... Lê mafê jinan tune ku banî hunermendan, niviskaran, helbestvanan, jinologan bikin û bibêjin çêlî rewşa me mekin!

75

Jinik diponijî. Li tişteki digeriya ku weke bersîv bide. Dûre got:

- Ez dizanim... jinên xirab hene, ne ku tunene...

- Ez careke din bibêjim. Weke jin, di wexta xwe de U ruyê dunyayê Hewa xatûn tenê hebû. Em bibêjin ew jî xirab bû, baş e! Bawer im tu çîroka Hz. ,Lût û keçên wî jî dizanî. Navnotiya ku bi pey Meryem xatûnê ket, heta roja îfoyîn jî ji bo ol û navê Isa yê reben rûreşiyêke mezin e. Di çîrok û dîrokan



de meriv rastî gelek jinên împaratoran tên ku... serqisê: dotmîra împatorê Romayê... Ma tu çîroka wê jî dizanî an ne?..

Dibin sedemên tac û textên mêrê xwe... ev yên ha hemî jî jinên bi nav û deng bûn. Ji xwe ji xêra vî nav û dengên wan çîrokên wan derketin holê, an ne ma ew ê kê pê bizani bûya. Bi hezaran jinên bêreng fesadî, dizî, nerindî, bêbextî û gelek tiştên din kirine... dikin, lê dernakevin.

Jinikê xwe ji ber masê vekişand, hêz da xwe rabû û bi dengêkî nîvçe got:

- Ez bawer im ez ê êdî biçim.

Mîna Bedran têngîhîştî be ku dîsa çewtiyek kir, ew jî hêdfîca rabû, destê xwe ber bi jinikê kir ku jê re bibê: «Ez viya ne ji bo te dibêm.» Lê xwiye mêraniya wîji ya xwe daneket û got:

- Ez têngêhîjim ku çima peyvên rast we jinan nerihet dike?

Ku di van gotinên min de çewtiyek hebe... wê çaxê divê tu û jinên weke te, biçin gazinên xwe ji niviskarên pirtûkên pîrozwer bikin. Tenê xwendevanek im ez. Min ew xwendine û li gor min jî rastiya jinê ew e, ewqas!

Jinikê hinekîbi hêrs û enirîn got:

- Ez dizanim tu xwendevanek î. Lê tu xwendevanekî xirab î, canekem. Xwendevanekî paşdemayî! Ez bala xwe didime te... te xwe bi doxîna jinan ve girêdaye û tu rexnên xwe U du tilî giyanê wan digirê. Serê jinê heye, kezeba jinê heye, pêj'n û dilê jinê heye... Çima tu çêlî devereke wê ya din nakî? Lê divê tu viya jî ji bîr nekî ku di şarezaiya civakên îroyîn de, ev tiştên tu dibêjî bi rastî jî nayê hişê kesekî. Ya rastî jin ne bi qasî mêran serhişk, ne bi qasî wan bêbext, û ne jî bi qasî wan xwînrij û devbixwîn in!... Jin kezêbşewutî ne, dilê wan tenik e,

ez ne bawer im ku jin rabin û merivan bikujin. Lewra ew dizanin...  
dizanin ku êş û azara hanm û mezinkirina merivekî...

ne tiştêkî bi gotinê ye ezbenî! Neh mehan ez wî giyanî di zikê  
xwe de digerinim û dûre bi ruyê dunyayê dixîhim. Lê tu çi dikî,  
mêro! Tu jî, ji wan leşgeran çêdikî û wan berdidî hev. Tu  
dibêjî «Çavên hev derxîhin!» Lê em jin wî tiştî nakin. Ku  
desthilatiya welêt di destê me jinan de be, ma tu dizanî em ê  
çi bikin? Wek ku di prensipên rêxistinekê de dihate gotin, em  
ê jî kincên leşger û polîsan biguherînin. Em ê kincên sipê U  
wan bikin. Dewsa keleşînkof û debançê em ê kirbît û hestan  
bidine destê wan û em ê wan berdin nava bajêr. Em ê ji wan  
re bibêjin: «Kîjan hemwelatî bixwaze cixarê bikêşîne, biçin cixarên  
wan vêxînin û aUkariya wan bikin...

Bedran bi mêrane, lê bi dengêkî nizmtir peyva wê birî û  
got:

- Baş e, ca hinekî rûne! Xwe ragirê, bêhna xwe teng neke!  
Ev tiştên ku ez dibêjim, min di pirtûkan de xwendine... ma  
wekî din... min çi jê ye!

Lê jinik rûnenişt. Bi hustuxwariyeke bêhêvî:

- Li min bibore , got. Divê ez biçim. Hevaltiya me ê bi hev  
neke. Zimanê me, kultura me, dîtina me û bawer bike hertiş-  
tê me ji hev cuda ne. Bi xatirê te!

Jinik bi gavên hêvîşikestî ber bi derê derketinê çû. Bedran  
jî dabû dû, li pey wê fikir pilepil û digot:

- Bawer bike, ez ne merivekî oldar im. Baweriya min jî ji  
hebûna Xwedê tune. Tenê min xwend. Ma gunehkarî ye ku  
meriv pirtûkên pîrozwer bbcwîne? Ku tu dîtina min bipirsî, ez

dibêm, bila herkes şilfûtazî bigerin, min çî jê ye? Tiştên ku Xwedê daye, meriv çima ji hev veşêrin!...

Bi van gotinên xwe re dengê bihîst: «Xwehafîz!» Jinika ku dîsa xwe wek horiyekê pêça bû, ji ber dêrê dûrket. Bedran U pey nêhirî û heta ku ji ber çavên wî wenda bû, gotinên xwe yên nîvçemayî xwe bi xwe didomand:

- Serekî hişk û ehmeq! Divê meriv vî seriya bişkîne, bişkîne! Çewtiya Hewa Xanimê bi min ketîye, namûsa diya Isa bi min ketiye. Vireko!

77

## ROJAPÎROZWER

Paşnîvroyeke roja heyştê adarê ye.

Deriyê saloneke mezin, U ser piştê mîna devê gurekî birçî vekirî ye û U bendî keç û jinên vî navçeyî ye. Ev payîna, ne tenê ji bo jinên rewşenbîr e. Bi gotineke din jinên gundî û bajarî, jinên bî û bi hêwî, ji hemî çîn û rengên civatê jin dikarin di vî deriyê re têkevin hundur. Lewra roj roja wan e.

Hundurê vê salonê bi nivîs û afîşên rojê hatiye xemilandin.

SandaUyên di hundur de, dikare hetanî pênc sed jinan jî bihewîne.

Lê anuha U gel ku dema vebûna gotara rojê nêzflcî saet û nîvekê jî derbas bûye, zêdetirî çar jin û sê serî zarok, di hundurê vê salonê de kes tuneye. Jinikek gundî tev sê zarokên xwe U rêzeke dawîn rûniştiye. Yeke goştîn, U rêza pêşîn, nêzîkî mîkrofona gotarê bi rûniştina jineke zana cî daye xwe.

Li ber devê deriyê derketinê keçeke berzewac U ser pêyan rawestiyaye û çavên wê her U der e. Jinikek jar û bejindirêj jî bi rewşeke xemgîn ber bi mîkrofonê tê. Fîstaneke sivik U xwe pê-

78

çaye û cotek solên mflîtanî di lingên wê de ne. Xwediyê porekî reş û lûleyî ye. Fflikên porê wê xwe berdane ser eniya wê.

Li ser ruyê wê î gulover dev û lêvên xweşik û pozekî entelektuel dixuye. Çentê xwe î piçûk U ber mîkrofonê datîne, keserekê vedide û bi tevgerek giramgîr dibêje:

- Xweng û dayikên hêja, biborin... biborin ku wext U me buhurî. Lê mbcabin U gel vê derengketinê jî em ê nikari bin dest pê bikin. Lewra em hêj çar kes civiyane ser hev. Em ê hinekî din jî bipên, heta ku...

- Heta ku xanim û xatûnên me tên... Ji mêrên xwe hîn bûne! Jinika ber mîkrofonê, vî dengê bihêrs ji rêza pêşîn dibihîse, U xwediyê deng dinêre û bi pişirîn dibêje:

- Xem nake, xwenga Şîlan. Ku mêr jî vî tiştî bikin, bi rastî xwîyekî ne baş e... ne baş e ku meriv ji wexta xwe dereng bikevin. Lê ji bo xatirê j'înbûyîha jinên me, em ê hinekî din jî U bendî wan bimîhin. Lewra em rewşa jinên xwe dizanin. Em hemîjî dizanin ku jinên me di çi rewşê de ne...

Xwenga Şîlan destê xwe ber bi rêzên dawîh dike, wê jinika bi sê zarok pêşan dide, dîsa bi wê hêrsa xwe ya berê peyvên jinika ber mîkrofonê dibire û dibê:

- Meriv di çi rewşê de dibe bila bibe... Binêre!.. U diya sê zarokan binêre! Di vê roja pîfozwer de jî mêrê wê U ber zarokan ne bûye. Lê... lê ew dîsa jî hatiye. Diya lawikan! Na Nesrînxan, na! Ev ne ji rewşê ye. Ev ji bêberpirsiyariya wan e. Ku meriv berpirsiyariya xwe bizani be, bawer bike meriv ê bikari be... Ma mêr çi ye, rewş çi ye! Ku ez jin bim û bbcwazim... ez ê hertîştî bikim, têgêbjîstî! Ku mêrê min U ber zarokan nebe, ez ê tev zarokên xwe werim. Paqijiya der û hundurê mala min e,

j'i bo xatirê vê roja pîrozwer bila di gend û gemara xwe de bimîne. Boyaxa serçavê min e, ez ê tev porê xwe î Uhevketî û tev kilîşkên çavên xwe werim. Lê... lê rastî tiştêkî din e, Nesrînxan! Ez tenê dizanim... ez dizanim ku anuha dîsa U derekê erzanî çêbûye û hemûyan berê xwe dane wir, an jî U dêra taxa hember xwarineke bêpere tê dayîn loma... Ez bi xaxên jinên me dizanim!.. Mêrê xwe dbcapînin, peran jê distînin û pê ji 79

zend û singê xwe re zêran dikirin. Ma ne gundî ne! Çi ji wan tê payîn!.. Ji tiştên wusa re çavên xwe çar vedikin. Lê... çiqas heyf e ku rojên weha pîrozwer jî tew ne U ser guhên wan e!.. Di vê navberê de sê jinên din bi pistepist dikevin hundur û tev kîsên xwe yên tiştan diçin U rêzeke dawîh, U kêleka hev rûdinin. Di vê bêdengiya kurt de, ji bflî xişîna kîsan deng tune. Ev xişîna kîsan jî bêhna xwenga Şflan tengtir dike. Loma carina U paş xwe dizivire, bi awur U xwediyên kîsan dinêre û di dilê xwe de weha dibêj'e: «Çi jinên çilek û nefsmirdar in! Xwedê dizane di tariya sibê de rabûne û berê xwe dane wan dikanan û yek bi yek geriyane. Nola meşkên ceftnekirî bêhnek genî didin der û hew!..»

Nesrînxan, U ser wan gotinên xwenga Şflan dbcwaze tiştina jê re bibêje, lê vê re nagêhîne û bi dengêkî zirav banî wan jinên U rêzên dawîn dike û dibê:

- Xwişkên hêja, U dûr... U paş nemînin. Werin pêş... ciyê me fere ye. Hûn jî kerem bikin, dayikên delal! Kerem bikin, werin pêş!..

Xwenga Şflan bi mirûzekî tirş berê xwe bi xwişkên hêja de dike û dibêhe ku çend dayikên delal jî nû dikevî hundur.

Tev wê keçika berzewac hemî jî ber bi pêş tîn. Nesrînxan kaxizekê ji çentê xwe derdbce, U ber mflcrofonê xwe xweş dike ku tişteki bibêje, an jî dest bi bernama rojê bike. Lê ji bo ku herkes ciyê xwe bigirê, hinekî xwe radigirê. Keçikek xort bi bêhnvedanek bezê ji nav wan jinên nûhatî vediqete, ber bi xwenga Şflan tê, destê xwe ji bêrîkek xwe derdbce, dirêjî wê dike û:

- A ji te re perê te Şflan abla(\*). Bi Xwedê ez ne gêhîştim ser. Heta ku ez çûm, navê şekalekê jî U wir ne ma bû... hemî kirî bûn, dibêje, ew jî U kêleka abla xwe rûdine û vebûna gotarê dipê. Xwenga Şflan zûzûka wan peran ji dest keçikê digire, tavilê di dereke xwe de vedîşêre û di ber xwe de bi dengekî pir nizm ji keçikê re dibêje:

(\*) Abla: Di tirkî de ji bo xwenga mezin tê gotin, di kurdî de li hinek ciyan weke heko an jî hekê bi kar tê. WW

80

- Çawa ne ma bûn? Qaşp dikaneke ewqas mezin e!..

Keçik milên xwe hildukute, lêvên xwe bi hev de dişidîne û dibê:

- Ez nizanim, abla. Mêrikê xwediyê dikanê digot, her yekî sê çar çot kirîne û anuha ferek sol jî ne maye. Tew mêrik çêlî jinikekê dikir, ya sitar! Ez bawer im jina mala Xalmist e. Çûye ji xwediyê dikanê re gotiye: «Min heyşt cot sol divêt.» Mêrik jî pirsîye ka kîjan numeroyan dbcwaze. Lê wê U mêrik vegerandiye û gotiye: «Det spelar ingen roU(\*).» Li hemberî vê hevoka wê, çavên mêrikê dikandar zîq mane û tînegêhîştiye. Dûre bi matmayîh ji jinikê pirsîye û gotiye: Çawa «spelar det ingen roU!?!..» Lê jinikê U mêrik vegerandiye û gotiye: «Ji

ber ku ji pêncsalîyan heta bîstsa Uyan U pey hev me heyşt zarok hene. Li gor keç û lawan, ku U lingên kîjanê were, bila ew têxe Ungên xwe.» Mêrik jî rabûye heyşt cot sol jê re daye ser hev.

Xwenga Şflan bi baldarî guhadariya van gotinên keçikê dike. Wusa guhê xwe daye ser ku ew jinên di vê navberê de hatine hundur û rûniştine, tew wê hay jê ne bûye. Loma dema ku çav U wan jî dbdhe, bi awurtûjiyeke bêtir U dora xwe dinêre û di dilê xwe de: «Çi nûrişkên bejî ne!» dibêje.

Ji nişka ve dengê ji mîkrofonê bflind dibe:

- Hûn hemî bi xêr hatine, hevalên hêja! Ez serokê Komela Jinên Çiyayê Bejî me. Dema meriv dibîhe ku wek hemî jinên dunyayê, jinên me jî di salonên weha de dicivin ser hev û berpirsiyariya xwe didine xuyakirin, meriv gelek kêfxweş dibe.

Dil dixwaze ku hemî cî û sandaliyên vê salonê bihata dagirtin. Lê xem nake... Wek ku hûn jî dizanin, 8'ê adara sala 1908'an bi jîf û jêhatiya jinên New Yorkê ji tevayiyê jinên dunyayê re bû sedema rojeke pîfrozwer. Ji wê rojê û vir de, di her 8'ê adarê de U her quncikê dunyayê, jin U hev dicivin, bi hev dişewirin, alîkariya hev dikin, bi pêş de diçin û bi awakî zanetir U (\*) Det spelar ingen roll: Bi swêdîye, wek ku xem nake an jî ne xem e. WW

81

vê roja xwe xwedî derdikevin. Loma divê jinên me jî U vê rojê xwedî derkevin û ji vê roja jinan bitamijin. Çima... çima jinên me jî weke jinên fransiyan nebin xwedî gotin? Ma em bi qasî kê nabin!..

Xwenga Şflan di ciyê xwe de ji dilê xwe teng dibe, di ber

xwe de dike pilepil û dibê:

- Xweliya min U serê jinên me be! Bi Xwedê ji zikên xwe re, ji kinc û boyaxên erzan re... heft jinên ûris û fransiyan jî bi paniyeke wan ya qelişî nakin! Hewûû!.. Ma hûn... hûn wer bi van mirîşkên anaj dizanin!..

Mîha ku sandaliyên kêleka xwenga Şflan U laşê wê hati bin hev û cî lê teng kiri bin, bêhna wê jî teng dibe. Ramanên di serê wê de weke hêlkanekê diçin û tên. Pîpikên çavên wê U derekê aliqîne û tew nikare guhdariya gotarê jî bike.

Lê dîsa jî dengê xweş û zelal ji mîkrofonê bflind dibe û U salona mezin belav dibe.

82

RABIFF

Bengî û Zade. Herdu rojhilatî, her yek bi hevala xwe ya rojavayî ve U restoranta Pauli ya U kêleka Dêra Paulayê rûnişti bûn, U bende xwarin û vexwarinê bûn. Ji bo ku pûçê nezaniya xwe U xwe nedin der û keçhevalên xwe ji dest xwe nerevînin, heta ku ji rojhilatiyan dihat xwe diguvişandin. Lewra ev hîna du roj û sê şevên wan bû ku hevdu nas kiri bûn. Di vê dema kurt de, tenê bi qasî saetekê û ew jî U ser Ungan bi hev re geriya bûn. Vê wextê jî dest ne dabû ku bi hinek tiştên hev bizanibin. Piştî demeke kurt, du garsonên keç bi frakên xwe yê reş xuya bûn. Nola pelapîtikên buharê kulîlk bi kulîlk bifirin, ew jî mase bi mase digeriyan û daxwazên mêvanan bi cî dihanîh. Dob hate masa rojhilatiyan û hevalên wan. Wek hemî mêvanên din, garsonekê ji her yekê wan re lîsteyeke xwarin û vexwarinê hanî û U ber wan jî danî. Bi pişirîn:

- Xwarin û vexwarinên me yê îşevîn ev in, got û U pêş wan



di destirmaniya wan de rawestiya. Fena keçhevalên xwe, rojhilatiyan jî sipasî wê kirin. Bêdengiyeke kurt. Heryekî ew lîsteya xwarinê di destê xwe de bir û hanî... û lê nêhirîn.

(\*) Omeletlorrienne

(\*) Cevappicci

(\*) PauU Olpanna

(\*) Rabiff

(\*)...

Bêdengî bi dengê Bengî hate birîn û di ber xwe de ji Zade re got:

- E, ma em nizanin bê kîjan xwarin çî ye û ji çî çêbûye ku...

Zade dengê xwe bilind kir û bi quretî got:

- Çawa nizanî, malava?!... Ez dizanim. Serqisê ev, ev û ev...

û ev yê ha jî... Hemî goşt in. An jî tişteki ku ji goşt çêbûyî ye.

Piştî van gotinên xwe yên ewle, tfliya xwe da ser navê xwarinekê û got:

- Binêre... ca U vir binêre! Te çî mîna gundiyan çavên xwe

U wan bel kiriye! Ku tu wusa bikî... bi Xwedê keçik ê ji me birevin.

Herdu hevalên wan yên keç, Usteyên di destên xwe de pêşanî

garsonê dikirin û pê re dipeyivîn. Bengî çavên xwe yên

bel û gundî çerixand ser tiUya Zade û got:

- Baş e, ev yê ku tu dibêjî, çî ye?

- Ev jîgoşt e. Goştê kutayî. Ê goştê ku kutayîbe...

Garsona nîvtaziya ku U bendî wan bû, nêhirî ku ew ê hîna gelekî U wir raweste. Loma rabû pirsî û got:

- Ez bawer im we birayara xwe da, ezbenî? Ka we kîjan xwarin divê?

Bêyî ku Zade zêdetir wexta garsonê bigire, tfliya xwe ya U ser navê Rabiffê du sê caran rakir û danî:

- Ev, got.

- Rabiff, erê? Baş e, lê we kîjan mey divê?

Rojhilatiyan hîha wext ne dîti bûn ku U ser meyê bifikirin.

Lê baş bû ku vê carê jî, Bengî bê awuqîh tiUya xwe da ser navê Val de Loire'yê:

- Me ev divê û şûşeyek tenê têra me dike, got û bi vê tevge-  
84

ra xwe ya destsivik dixwest xwe U şarizayiyê dayne.

Piştî ku garsonê sipasiyek got, bi silava çpgê ji wan dûrket û çû. Her cara ku frakên garsonan ba digirt û di ber masa wan re U ba diketin, çavên rojhilatiyan bêhemd U pey dilîzikîh û serê wan tevUhev dibûn. Lê dîsa jî xwe U nezaniyê xwedî dernedbdstin û Ungên xwe davêtin ser hev.

Ji bo ku tenê nemînin an jî keçhevalên xwe bêdeng nehêlin, Zade xwe ber bi masê kir û got:

- Çi ciyekî xweş! Bi rastî jî romantflic e, ne wusa Sîmone?

Sîmona devliken:

- Xirab nine, got û çavên xwe yên hêşîn U dora xwe gerand.

Sûssîya hevala Bengî jîxwe havête nava axaftinê:

- Ez bawer im ji sedsala hîjdehan de maye, got û bi tiliyên xwe ruyê xwe î xurî mist da. Ji bo hemî pirs û bersivên ku dihatin gotin, Bengî tenê bi serhejandina xwe beşdarî van tiştan dibû. Bi tevgerek wusa bû ku yekî nizani bûya, bi nêhirîneke pêşîn re ew ê bigota viya porê xwe U ciyên weha sipî kiriye. Bi du şûşe mey û çar piyalan garson vegeziya û hat. Bi kubarî piyal dagirtin û bi nazikî da tamandin. Ê herweha piyalên

wan hemiyan jî bi destê garsonê hati bû dagirtin.

Di pey hanîna meyê re gelek wext ne buhurî bû ku dîtin garson bi du namkiyên ferfûrî tavilê vegeriya jî. Piştî rojhilatî têngeluştin ku xwarin yên wan e, ji vê zûhatina xwarina xwe ew jî kêfxweş bûn.

Lê dema ku di dest garsonê de çav U xwarinê xistin, gwînê wan vê re guherî û mirûz lê tirş bûn. Wusa ku, tew ji bîr kirin sipasiya garsonê jî bikin. Xwarin; kevçiyekî pîvazên kutayî, kevçiyekî îsota sor î hûrkirî, kevçiyekî dibên sor î dagirtî, bi qasî sê kevçiyên goştê xagî yê kutayî û zerikek hêka xagî U ser vî goştî bû. Pîvaz, îsot, dîb û hêk dibû ku bi xagî bihata xwarin, lê goşt? Ji xwe pirsgerêk jî U ser vî goştê xagî bû. Ew ê bi çi awayîbihata xwarin!

Herdu rojhilatiyên mirûztirş U hev nêhirîn û dilên xwe bi hev şewutandin. Kenekî sar, tirs û şerm U ruyên wan tevlihevî bû. Aya wan ê ev nezaniya xwe çawa binixumanda? Ev rewşa ji ber çavên keçhevalên wan ne reviya û ew jî pê hesiyan.

85

Wan dît ku goşt xagî ye. Bi mirûztirşî pişirînekê bi wan jî girt. Bengî kêr û çetel girte destê xwe, xwe U ber masê bir û hanî ku kesek pê nizani be. Bêdil pozê çetelê xwe di goştê kutayî de kir û bê daxwaz di devê xwe de danî. Ava goştê xagî, U ser lêva wî ya jêrîn biriqî. Dûre jî hinek pîvaz, hinek îsot... çav U belengaziya Zade xist û di ber xwe de jê re bi zimanê wî got:

- Tu çi wusa pê dilîzî, heval! Noîa mêran bixwe! Tu ê nuha me di nava van hevalan de şermesar dendnî.

- E, ma goştê xagî tê xwarin?!...

- Te xwest, heval. Te got, ez dizanim bê ev çi xwarin e...
- Min got, lê... ma min çi dizanî bû ku goştê xagî ye! WeUe ev nayê xwarin.

Bengî:

- Lê tu viya baş bizani be... bi şeref ku em di xwe derxîhin, em ê di nav xelkê de bibin xax. Do yek û îro jî du roj in ku me ew dîtine. Şeraba me hîj di şûşekê de ne hatiye ber me. Ku tu ji nuha de wusa bikî... binêre, ku ev j'ahr be jî bixwe! Tişt nabe. Ku dilê te jê U hev dikeve, çavên xwe bi hev de bişjdîne û bixwe. An ne...

- Loo, ma ez ê çi bbcwim! Bi navê Xwedê ez ê verişim.

- E, ma ji te wetrê ez ji dil dbcwim, an ez jê hez dikim? Erê, ez U xwe nadim der, lê... Bi Xwedê U pêş çaven min bûye wek goştê mirar. Tu jî dizanî ku bûye xwîna mêrekî û ketiye hustuyê me, em çi bikin?... De qene bêdeng bbcwe û kêleka me ya bi rêx rayê xelkê nede!

- Nabe birayê min, nabe. Bi navê Xwedê ez ê nikari bim!

Tu were em ji xwe re xwarineke din bixwazin. Ma çi hewce ye...

Bi vê hevoka xwe ya nîvç re, Zade hinekî jî bi hêrs pozê kêra xwe U binê goşt xist û bêyî ku ber bi devê xwe bibe, bi şûn de danî. Ev axaftina di navbera herdu rojhilatîyan de, bêyî ku hay jê hebin, ji pîvana restorantê derketi bû. Di vê navberê de mêvanên restorantê pirî caran bêhemd hustu U xwe badidan û U wan dinêrîn. Bi her awayî dîyar bû ku mijara vê axaftina wan, U ser xwarina wan e. Keçên roj'avayî jî bi qa-

86

sekî kirin pistepist û dûre Sîmone zivirî ser Zade:

- Ma xwarina we ne bi dilê we ye? An xwarin bi çewtî hatiye?

Zade, fikir ku wek yekî belengaz giUyê xwe bi wê de bikira.

Lê dûre tavilê U xwe varqilî, ne xwest rastiya xwe pê bide

zanîn û got:

- Na, na... min ev xwarina xwest. Min xwest lê... min nizanî

bû ku ew ê wusa... tamsarkî be.

- Ma te qet berê goştê xagî xwari bû?

Zade bi rûşermî:

- Erê weh!... Lê ez nizanim çima U vir... Li ba me vê xwarinê

gelekî xweş... got û mirûz U xwe tirş kir. Dîsa pozê kêrê di

goştê xagî de kir û vê carê ber bi devê xwe bir. Sîmona rojavayî

zûzûka U pêş, ji ber masê hêz da xwe û got:

- Raweste... ca raweste! Ev xwarina, wusa nayê xwarin. Divê

tu hemûyî tevUhev bikî û îsota wî jî divê zêde be... ma ez

dikanim alîkariya te bikim? Ca tu vî çetel û kêra xwe...

Keçika din jî rabû ser xwe ku ew jî alîkariya Bengî bike û

xwarina wî U nav hev bbdne. Lê Bengî nêhirî ku ji bflî keçhevalên

wan yên rojavayî, hemî mêvanên restorantê U wan dinêrin.

Wî ev nezanî û kêmasiyên ha dîsa U xwe dananî û got:

- Na na, sipas, Sûssî. Ez weha ciyê ciyê jê hez dikim.

Bi formula keça rojavayî, xwarin dîsa di gewriya Zade de

ne çû xwarê. Nêhirî ku nabe, bi hatina xwarinên keçên rojavayî

re, wî jî rabû ji bêgavî ji xwe re xwarineke din ji garsonê

re got.

Li ser vê tevgera Zade, serhişkî U Bengî bû bû sonda mêrê

berê û bi rika mirîşkekê dbcwar. Carina jî di bin çavan re U

Zade dinêrî û bi zimanê wî digotê:

- Ez êdî bi te re nagerim, heval. Tu ê ku... dest û lingên te

U ber sê kevçî goştê xagî U hev digere... Di pey ewqas serêşê re, te dîsa bi ya xwe kir. Te em rûreş... Te dît ku me bi çî awayî ev keçikên ha peyda kirin.

Her pariyê piçûk î ku ji namkiya Bengî kêmbû, ji bo wî serketineke mezin bû. Berê, çavê wî jê ne dibirî ku xwarina U ber xwe biqedîne. Lê piştî bîstekê, dît ku bi qasî du pariyan

87  
tenê di binê namkiyê de maye. Tirs lê şikiya bû û serbilindî para wî bû êdî. Sûssiya rojavayî dît ku xwarina Bengî U xelasiyê ye, zivirî ser û pirsî:

- Xwarin bi te xweş bû, Bengî?

Li ser vê yekê Bengî kevçî û çetelê di dest xwe de, bi quretî di namkiya xwe de danî û got:

- Na weUe, xweş nibû... lê xirab jî nibû.

- Ma ev cara pêşîn e tu goştê xagî dixwî, an?...

Mîna ku Bengî bibêje: Ma ne şerm e! Bi kenê xwe î nîvçe peyva wê di dêv de birî û bi rûsipîtî got:

- Na, na. Ez nizanim, ku ez bibêjim tu bawer dikî an ne...

dema ku ez U rojhilata navîn bûm, xwarina min sê dan ev tişt bû. Lê mîna ku heval Zade jî got... U vir çima wusa çêdikin, ez tînegêhîjim. Bêxwê, tamsar, xa... Ango U ba me wusa xweş, ewqas xweş çêdikin ku...

Piştî van peyvên xwe, Bengî dîsa dada kêr û çetelê xwe û dest bi xwarina xwe kir. Di van du pariyên xwe yê dawî de, kêr û çetelê xwe wusa U binê namkiya ferfûrî dida ku, mîna ji hemî mêvanên restorantê re bibêje: Ez goştê xagî dixwim û minqedandjî.

Bengî bi vî awayî, xwe ji goştê xagî pak kiri bû. Piştî ku

piyalek şerab jî di ser de vexwar, rabû çû avdestxanê. Gelek ne buhurî, ji hêla avdestxanê dengê ne xweş hat bihîstin. Biqînekê bi hemî mêvanên restorantê girti bû û dikeniyar, dipan ku bizani bin bê ew kî ye vedirişe.

88

## ŞANOGER

Tos, xortekî bi bejinûbal e. Anuha nû ji malê derketiye, mîna ku U navnîşaneke tevUhev bigere, an jî çavên xwe U pisikekî wendabûyî bigerîne, U dora xwe dinêre û di kuçeke fere de bi lez dimeşe. Lê ev meşa wî bi awayekî serbflind e jî. Li serê kuçê pêrgî hevalekî xwe tê û zûzûka jê re dibêje:

- Divê tu werî, Dewrêş. Şikir ji Xwedê re em rastî hev hatin.

Min jî çavên xwe digerland ku nasekî bibînim. Min gelek dixwest ku hevalekî min î nêzflc jî bibîne. Mîna ku Dewrêş, ji vê rewşa wî keti be şika tiştê nebaş, bi dengê nivçe û tevUhevî dibêje:

- Kuderê?... Ez werime kuderê, çi bibîhim?...

- Tiyatroyê. Ji piyesên Brecht, Tivinga Carrar Xanimê ye.

Hevalê wî dike ku bibêje, aya bilêt mane an ne, lê Tos pêşiya pirsê lê dibire, bi piyê wî digire û herdu bi lez berê xwe didine avahiya salona tiyatroyê. Tos di rê de didomîne:

- Rolekî piyesê dane min jî. Ez ê ji bilêtfroşê ber dêrî re

89

bibêjim: Ev hevalê min e. Bila ji rêza herî pêşîn ciyekî baş ji te re veqetîne. Ji bîr neke, piştî piyesê jî em ji xwe re biçine ciyekî romantîk û em ê U ser hunera tiyatroyê bipeyivin.

Ya rastî, Dewrêş ji kêfxweşiya vê hunermendiya hevalê xwe î Tos, U ser rêza pêşîn û ciyê xweş nafikire jî. Lewra ew

dizane ku Brecht şanonivîsekî mezin e û rolgirtina di piyesên wî de hunermendiyê divê. Loma ji dilxweşiya xwe û vî hevalê xwe, bêyî ku zêde U ser bifikire, vedigere ser hevalê xwe û dibêje:

- Tişteki gelek û gelekî hêja ye. Pir baş bûye ku rolek dane te jî...

Tos, mîha leşgerekî serketî U ser piyê xwe U hevalê xwe vedigere û bi pişirîn dibêje:

- Lê ez ji te re bibêjim, ku bi ya rejîsor bûya wî cî ne dida min. De tu guhdar bike, ez ji te re ji serî de kat bikim... Tişteki seyr e! Çer ku min bihîst tişteki weha heye û dest bi provayê jî kirine, ez tavilê çûm. Ez çûm, min xwe havête bextê rejîsor ku rolekî bide min jî. Pêşiyê wî kir ku bibêje, na. «Bi daxawa»got. Lê piştî min jî dûrûdirêj jê re çêU hunera tiyatroyê kir û min pê da zanîn ku ez ê ji heq rolê xwe derkevim, hinekî nerm bû. Rejîsorekî zana bû. Ji min re digot:«Divê xwî û tevgerên qeşmer û maqûlekî li ba şanogerekî hebe. Şanogerekî baş, divê bikani be bigirî, bê sedem bikene... wusa ji dil bikene ku temaşegîf têdernexîne ew kenekî şanogerane ye...» Ez birakê te me, min jî lê vegerand û got: «Ez dikanim... ez dikanim mîna ehmeqekî bikenim û ez dikanim bigirîm jî.. Ku te bivê, anuha ez U ber çavên te jî bigirîm.» Dûre min serê xwe hinekî tewand û min mirina pîrika xwe hanî bîra xwe. Çi mirin bû Xwedê! Kûçikekî har bi wê girti bû. Piştî ku nexweşî lê azirî, ew jî har bû. Kef û gilêz bi devê wê î bêdiran diket û weke dêlegureke U ber çêlan xwe davête ser merivan. Mîna anuha tê bîra min. Bavê min ew havêti bû paş deriyê oda me ya piçûk û derî U ser kilît kiri bû. Ez piçûkekî heftsale bûm wê çaxê. Ez diçûm ber pencerê, ji hêla derve de, di nava şîşên



hesinî re bi dflşewatî min U wê dêlegura pîf dinêrî. Dêlegura ku ez ji pişta wê danediketim, ji hemêza wê dûrnediketim...

90

Hertim çend mewûj û nokên qelandî di ber pişta wê de peyda dibûn. Dema min devê xwe ber bi destê wê ji hev dikir, taviê têdigêhîşt... Bi pişirîn: «Kurê kûçikan!» digot û tiştek dbdste devê min. Ji diya xwe pirtir min ji wê hez dikir. Anuha jî min nikanî bû ez nêzîkê wê biçûyama. Bavê min di rocinê re nan davête ber wê. Nan dibêjim lê... tenê keriyek nanê tisî bû. De qeyê bavê min jî dixwest ew bimire û nemire... Wê devê xwe jî bi nan ne dikir. Ne ku devê wê î bêdiran nanê tisî ne digirt, an dilê wê ne diçûyê... ez dûre têgêhîştim, ji ber êş û azara xwe wê hay ji xwe tune bû. Şev û rîj her kûrekûra wê bû. Ber bi rovakê dema tirêjên royê didan pencera oda me ya piçûk, ev kûrekûra wê bêtir berz û biUnd dibû. Bavê min jî hertim danê êvarê palaseke reş ji derve de dikişande ber pencerê ku tarî bibe. Wê çaxê jî agir bi kezeba min diket û ez ji wan deverna dûrdiketim. Piştî çend rojan deng jê hat birîh û pîrika min miri bû. Di ser mirina wê re ewqas sal derbas bûne, lê rewşa wê ya wê rojê, mîna îfo U ber çavên min e. Her gava ku ez bi bîr bînim, weha hêsir bi çavên min dikeve û ez dbcwazim bi dengê bflind têra xwe bigirîm...

Li vir dîsa av bi çavên Tosê şanoger dikeve. Lê anuha herdu hevalbendan xwe gfliandine avahiya salona tiyatroyê. Di derbasbûna hundur de, bilêtfiroşê U ber derî bi dengê nizm tiştina ji Tos re dibêje. Tos jî bi bilêtfiroş dide zanîn ku ji bo hevalê wî ji rêza pêşîn ciyekî baş bideyê û zûzûka ji salonê derbasî hêla hundur dibe.

Bi qasî kişandina du cixaran wext dibuhure. Dûre weke hemû temaşegîran Dewrêş jî dikeve hundur, U rêza pêşîn U ciyekî xweş rûdine. Gelek nabuhure, lampên salonê vêdisin û di pey re jî muzikek.

Piyes di nava ronahiyeke mirî de bi bergeheke weha vedibe. Di şevreşiyeye buharê de kepireke piçûk dbcuye. Di quncikekî oda vê kepirê de, ji wênexaça pîrozwer peykerekî reş î mezin heye. Jineke U dor salên çeU nan dipêjîne. Xortekî nûgîştî U ber pencerê şivedarekî masîgiriye rêş dike.

Dewrêşê U rêza pêşîn rûniştî, baş bala xwe dide ser piyesê. Kîsikekî bi dîwêr ve, textikekî herî piçûk jî bala wî dikêştîne.

91

Piştî ku çavên xwe U hemî dekorasyona hundurê vê oda piçûk digerihe, têdigêhîje ku ev kepireke masîgîran e. Dema ku dîaloga piyesê bi pirseke jinika şanoger dest pê dike, ji nişka ve tişteke dikeve bîra Dewrêş. Aya di piyesê de navê hevalê wî çi bû? Heta demeke kurt jî ev pirsê ha ji bîfa wî naçe. Lê dûre di dilê xwe de: Xem nake, wexta ku derkeve ez ê bizani bim, dibêje û bê tewatî U bendî derketina hevalê xwe ye. Deriyê kepirê lêdikeve, dilê Dewrêş dike gurpegurp ku ew ê hevalê wî be, lê na, yê ku dikeve hundur, U gor piyesê merivekî navsere û westiyayî ye. Piştî demekê keçeke ciwan U hêla hundur, U ber deriyê kepirê xuya dibe. Dewrêş di dilê xwe de: Ev jî keç e, dibêje û dîsa bi mereqdarî U bendî hevalê xwe ye. Her cara ku şanogerekî nû dikeve hundurê kepirê û U yên berê zêde dibe, bi dilpekîni çavên Dewrêş jî her U ser wan digere. Digere ku ew bibîne û bizani be ka hevalê wî di çi rolî de ye, û ji heq rolê xwe derdikeve an ne. Heta ku metranekî

bisal û di pey re jî pîfejineke bi kincên reş dikevîne hundurê kepirê, çavên Dewrêş her U şanogerên nû digere. Ev mereqdarîya ewqas lê zêde dibe ku tew bala wî ya U ser piyesê jî namîhe.

Li dereke piyesê U paş deriyê kepirê pinepina dangan tê bihîstin. Dûre derî heta dawiyê vedibe. Sê jin destên wan U ser sîngên wan çep û rast dibin, bi gunehweşîh dikevîne hundur û U hêlekê, U ber dîwêr radiwestin. Li pey wan jî du masîgîran cendek danîne ser darbesteke ji capûnekî sipî û di deriyê vekirî re derbasî hêla hundur dibin. Şanogerên masîgîr tev darbesta ji capûnê sipî, cendek U rasta sahnê, U pêş çavên hemû temaşegîrên salonê datîhin û di nav xwe de U ser dikevîne galegalê ka kê kuştiye û çawa hatiye kuştin.

Cendekê ku U wir hatiye dirêjkirin, bi pêşmalekê jî hatiye nixumandin. Ango ji bilî du destên daketî, devereke mirî ne xuyaye. Weke ku ew şanogerên U wir nizanin bê kê kuştiye, temaşegîrên di salonê de jî nizanin bê ew kî ye û kê bi çi awayî kuştiye.

Piştî dîalokeke kurt lampên salonê vêdisin û çepeçepa destên temaşegîran dest pê dike. Ev jî dide xuyakirin ku dawîya

92

piyesê hat. Bêyî Dewrêş zêde U ser bifikire ku hevalê wî derneket, wî ne dît ku hevalê wî di çi roU de bû û navê wî çi bû, ewjî U çepikan dixê.

Bi vê bextiyariya mêvanên xwe, şanoger jî di binê tîrêjên rengoreng de cot bi cot derdikevin sahnê, direvine hundur, dîsa vedigerin pêş temaşegîran û bi silavên hunermendane xwe U pêş mêvanên xwe xwar dikin. A wê çaxê çavên Dewrêş

U hevalê wî dikeve. Ew dibîne ku di nava şanogeran de Tosê hevalê wî jî dibeze û ew jî tê xwe U pêş temaşegîran xwar dike.

\*\*\*

Heta ku hemû temaşegîr derdikevin û diçin jî, Dewrêş U ber deriyê derketinê U bendî hevalê xwe î şanoger e. Dipê ku bi hev re biçine ciyekî romantfîc. Di dawiya dawîn de bi hilkehilk û kêfxweşî, hevalê wî derdikeve û tê. Bi hatina xwe re bi piyê Dewrêş digirê, vê carê jî berê wî ber bi ciyekî romantfîc dike, bi hev re dimeşin û şanoger dîsa di rê de didomîne:

- Bibore, Dewrêş, dibêje, rejîsorê me pir kêfxweş bû bû.

Gelek pîrozbahî jî girtin. Digot em ê biçine Fransayê jî. Ez loma hinekî derng ketim. Lê... te çawa dît, baş bû, ne wusa?

Dewrêş:

- Bi Xwedê ku tu rastiyê bibêjî, bala min pir belav bû. Ez têngêhîştim ku piyes jî li ser çî bû.

- Çawa, ezbenî? Qaşo ji rêza pêşîn jî min ji te re cî veqetandi bû. Baş e, de ka bibêje, ez ji heq rolê xwe derketim, an ne?

- Bi rastî jî ku tu rastiyê bibêjî... malava, heta dawiya piyesê jî ev çavên min her U bendî te bûn. Min digot tu ê kengî derkevî.

- Rast e, rolê min rolekî dawiyê bû. Lê tevayiyê piyesê U ser min bû. Min dibihîst... di paş perdê de min dibihîst ku hemîjî çêtt min dikin. Çawa, ez rolê xwe xweş Ustim, ne wusa? Mîna ku Dewrêş nikani be dîtina xwe, an jî tiştên di dilê xwe de rasterast bibêje, U hev digirêne û dibê:

- Bi rastî jî... wek ku min got... min ne dît ku... ma tu di çî roU de bûy?

- Te çawa ne dît malava! Tu bi xwe U rêza pêşîh rûniştî bûy. Divê te dîti be. Ji sedî sed te dîtiye... îcar rolê min U min dihat, ne wusa?

Nola ku Dewrêş ji rêza pêşîn jî, ji hevalê xwe jî şerm kiri be, hinekî soromoro dibe û dibê:

- Bi rastîjî te çi dikir?... Ango di rolê xwe de...

- Min tişteke ne dikir. Lê rejîsor jî gelekî ji min hez kir, ha!

Dûre jî hat destê me hemûyan şidand û pîfozbahî U me kir.

Pir pesnê me dida. Rolê min, ji bo min tew jî astengî dernexist.

Tê bîra min di destpêka provayê de jî, rejîsor U gelek

hevalan hêrs dibû "wusa ne, a weha!" digot û xwe hêrs dikir.

Lê dema ku prova dihat ser min û rolê min, bawer bike, astengeke

herî piçûk jî derneket. Di prova cara duduyan de rejîsor

ji min re got: Zêdetir jî pêwîst nake ku tu beşdarî

provayê bibî. Rejîsorekî mezin e. Tabilê têdigêhîje ka meriv ê

di çend caran de ji heq rolê xwe derkeve. Lê ez jî... min pir

xweş kir, ne wusa?

Dewrêş dike ku bibêje, «Ez nizanim û min tişteke jî ne dît.»

lê ji bo xatirê rêza pêşîn û ciyê xweş nabêje. Serê xwe dbce ber

xwe û weha dibê:

- Ez çi bibêjim...

Şanoger:

- Bibêje, ezbenî, bibêje. Tu çi dibêj'î bibêj'e... ne ji bo hevaltîyê,

lê ji bo Xwedê... ku ez bi kêrî rolê xwe ne hati bim, rasterast

U ruyê min bibêje.

Dewrêş ji bo ku tişteke U ser hevalê xwe û rolê wî bibêje,

wan hemû şanogerên piyesê yek bi yek tîne bîra xwe, çavên

xwe U ser ruyên wan hemûyan digerîne, lê dîsa jî hevalê xwe di nav wan de nabîne. Ji bo ku U ber hevalê xwe şermesar dernekeve û tişteki bibêje, pirseke weha dike:

- Di rol de navê te çi bû?

Li vir, Tos bi awayekî tinazker herdu destên xwe ber bi Dewrêş vedigirê û dibê:

- Ma ev jî pirs e! Mîna ku tew tu ne hatiye vê piyesê û te piyes ne dîtiye... Navê min... Juan bû navê min. Ji serî heta dawiyê jî herkesî çêtt min fikir. Ji xwe piyes U ser hebûna min 94

ava bû bû.

Bi hêviya ku ew ê êdî bikani be U ser piyes û rolê hevalê xwe ditinên xwe bibêje, rûkeniyeke nivçe U Dewrêş diyar dibe.

Lê dîsa jî ji bo ku baş pê ewle bibe, tişteki weha dipirse:

- Na xwe ew miriyê ku masîgîfan dabûn ser darbestê û ji newalê hanî bûn, tu bûy?

- A rihme U bavê te! Erê lê... ew ez bûm. Min rolê xwe xweş kir, ne wusa?

Dewrêş bi pişirîh:

- Malava, dibêje, tu jî giUyê xwe dikî... ma ez ê çawa bizani bim ku ew miriyê di binê pêşmalê de tu î? Ez ê çawa te nas bikim?

Bi van gotinên hevalê wî re nerihetiyekê dadigirê ser Tos, mîha ku ew hemî keda wî U avarê çû be, hinekî jî bi enirîn U Dewrêş vedigerîne û dibê:

- Ehmeqek bû. Dekoratorê me ehmeqekî serhişk bû. Min j'ê re got, pêşmalê navêje ser min, min bi pêşmalê nenuxumîne!...

Min jê re got: Erê di rolê xwe de ez yekî mirî me, lê divê

temaşegîr min bibînin... lê wî dîsa bi ya xwe kir û ew pêşmala  
havête ser ruyê min... firqûzê firqûzL.

Di riya wî ciyê romantfîc de herdu heval heta demekê jî bêdeng  
dimeşin. Li derekê ev bêdengî bi pinepina şanoger tê  
birîn û di ber xwe de weha dibêje:

- Ango kesî ez nas ne kirim, erê...

95

Pirtûkên ku derketine

KEÇA KAPÎTAN

A. Pûşkîn

roman

MIRINA KARMEND

A. Çêxov

kurteçîrok

«

ARDÛ

Ji kurteçîrokên gelêrî

Nivîsende: Hesenê Metê

\*

TILÛRÊ BÊGANE

Redwanê Alî

çîrok

Pirtûkên dê derkevin

MERJVÊN REBEN

F. Dostoyevskî

roman

\*

HERIMANDINA JIYANA KATHARINA BLUM

Heinrich Böll  
roman  
Adresa Xwestinê:  
Weşanên Welat  
c/o KFH, Box: 4088,  
141 04 Huddinge/Sweden  
WESANÊNWELAT  
\*\*

## SOM CÎHAN ROJ

Çîrokeke Xav  
Reşemî 2002  
www.amude.de

1

Çapa dijîtal  
Sîrwan Hecî Berko Malpera Amûdê 03/2002  
www.amude.de info@amude.de

Çapkirina vê pirtûkê bêyî destûra Cîhan Roj û malpera Amûdê qedexe ye  
www.amude.de

2

www.amude.de

"Nînim nînim nînayê ha nînayê ha nînayê ?ibKim ji malê dunyayê ha  
nînayê ha nînayê f7ê fe sebra min nayê ha nînayê ha nînayê Nînim nînim  
nînayê ha nînayê ha nînayê ?ibKim ji malê dunyayê ha nînayê ha nînayê  
f7ê fe 1<ewKa min nayê ha nînayê ha nînayê"

Tu {-ûy êdî qey nayê ha nînayê ha nînayê bê fe 1<ewa min nayê ha nînayê  
ha nînayê ?ibKim ji malê dunyayê ha nînayê ha nînayê"

Ji \orî\::e,\:: da~i\::an ...

3



Destpêka Ayeta Rizî

Dîsa demsala bi însan biyan;ji bo şîroveyan wext li herkesî fireh bû. Zerîxan ku pêncî û heft salî bû li pêş mal ,li ber kuçik bi cîrana xwe re şîna şeş ciwanên ku di navbera Arnawit û îtalyayê de germ dikirin;ji kesên fetisî hew jê yek xwarziyê gundiyeke wan bû.lê wek ku zaroyên wan fetisî be hêsir dibarandin.

Ew û sipîndara sê sale dişibyan hev u du ;çawa ker ,bi dev, birîn li darê vekiribû herwiha şer jî birîn li laşê wê vekiribû.Lê ew mîna keke ji Erîch Fromm re ku , "Hezkirin huner e." goti ye.

Van salên dawî êdî li fîstanên qedîfe bêrîk nîn in,pêş ber bi jor vekişand,ji bêrîka kiras de çend şekirên nav lalîsa derxist da Nebo.Dest da ber xwe,ber bi mirîşkan ve , "Kiş kiş mîratnon,ma hun ji kulê têr nabin" got,li Nebo zivîrî:

"Ew welatên Ewrûpa li me bûye wek sa ya sorikan;sorikan dergûş ji me digirt

ew jî xort û azevan digirin;ji bo hinekan çiya teng e,ji bo hinekan jî kulînek pir fire ye ... " Nebo bi qasî wê ji rewşê ne xemsar bû:

--Lê lê, de niha heq bidana wan .. !

"Me ji mêrê xwe û ji xwe xêr nedît emê çer xêrê ji xelkê bimînin ... "

--De diya min,wele diherin û tîn wer ciwamêr û canik dibin;awantî û kumreşî bi saya zariyan û saya wan wek mar ji nav me vekişiya,ev jî bes e

...

Zerîxan malika cîran rê Nebo da,bi dengê ji dengê kerengperek siviktir,"Aha,bûka ter û can,ev heft Sal e bê mêr maye,ne mir ne jî,waxtê li pêş derî destan pevdixe û kûr li asîman dinihêre ez pê re dihelim ...

"got.Nebo jî bask li xwe vegirt:

---Ew jî rast e,tu pê hesiyayî, nizanîm,ji êşa mêrê xwe hingiya giriya rehên çav lê xera bûne,bûka ewkê lê ... de tu bibêje ... ha,Xalîde lê ... ka hiş .. hiş jî bi me re nema ..

Pelên dara sipîndarê ku di ser sacan de dawêşiya bûn ji sivînekên xanî de diweşiyên.zaroyên li pêşber bi çek ên ji darik şer gur dikirin carna deng li wan

dibirî ... Dengê Şevgerê heft salî bû vêca deng li wan dibirî:"Himmm,de wer îja dora min û te"digot ji dîlê bê çek re û ew ber bi mêldarên xwe ve vedikişand.Wextê lingê Hêşar li kevir ket bi hêrs pekand ser Şevger:"Ê niha,ez lîstik mîstik berdim tu îja ji destê min çer dikî .. ?"

Tîrçîn bi Nebo û Zerîxan ket.Zerîxan bi lorîk dimand:"Ez nizanîm dilê ku evqas peritî çawa ku tê disekine, dikane dunyayê bihewîne ... qey em hîn bûne ... "

Nebo bejna hûrik hinek dî livand.Ji Zerîxan qasî panzdeh salan piçûk bû.Bi zimanê xwe mêrê xwe ji kubarek modern bêtir bi xwe ve dabû girêdan .Yeka wê nedibû dudu.Jinên dî bi piranî ji hesûdî jê re,"sihêrbazê" digotin.Têkiliyên Zerîxan û mêrê wê êdî tu bandor li jiyana wan ya rojane nedikir. Bi gotina wê,"Hemî jan û êşên jin û mêrtiyê di kêsek piçûk de avêtibû avê."Wê kevira dida ser kevirî jî ji bo lawê xwe Hadî bû ... Çend caran anî ser devê xwe ku ji Nebo re bibêje wê Hadî jî bişînin "Fransîz"dîsa dev li xwe sar kir.

Nebo wek zaroyek şermok dest ji bêrîk de vekişand û ber bi devê xwe ve bir. Wek beniştê kerengan di dev de be bi çêj dev lê diçû û dihat.Zerîxan bi matmayî,"Keçê, mala bavê min neşewite,nebî tu hê nermokê dixwî?"

Reng li Nebo sar bû:

--Xaltî, ez mîna miha bitewişe xwê ... got û bi pîjikê di destê xwe de rê dida delava li dor dara sipîndarê ...

Hadî li koşeyê xênî pişt li dîwar asê,serî ber bi nav çongan ve xar,gavên gêreya ku pariyek nan di dev de dimeşiya dijimart.Nozdeh salî bû.Rû bi çû riyek şimayî reng dida.Ev salek bû ku dest bi kişandina cixarê kiribû.Ji gundê sed xaneyî

www.amude.de

4

deh kesên pê re hevsal mabûn;ji wan pênc kes serî dabûn riya bi êş û janê zîstan,Çar kes jê jî serî dabûn riya çiyê.Ji gund bêtir hevalên wî navçeyî bûn.Hevalên wî ên ku wek mîlîs dihatin zanîn jî hatibûn girtin.Li hember wî bav her ku dest li serê gê mis dida kelxwêdan bi ser wî diket;du ga bi tevî zêrên êta wî,berdêla çûyîna wî ya Ewrûpa ...

Bi hezaran çîrokên rêwitiyê û bi hezaran jan û kulên jiyana li ewrûpa bihîstibû;her çîrokek li ser pişt wî zinarek ... Oest avêt bistiyek bîhokê,ji bîrve kir ku demsal payîz e;bistî bi xem û hêviyek di heriyê de daçikand ku şîn bê.Cixara ne vêxistî di dest de ber bi taldeyê ve averê bû.Çend roj bû ku di nav gund de dimeşiya serî ber bi jêr bû;niha li derî gund bû dîsa jî serî ranedikir;pê wisa dihat ku li zinar û kaşan binihêre dê hemî ked û bîranînên xwe ên bi şev wek mey tek veşêre!Jê dihat ku xwe li kaş bigindirîne,derûdor qoleçan kir,cixare ji bêrîkê derxist û xist dest,mil da ser çavan û gindirî ... Li perava cohoyê serdeverû dest û ling li xwe dirêj kir,hewîniya (sebir)wî nehat,bi keviran bendek li pêş avê avakir,av di terikên keviran de rê dida xwe;xalibûna derdor wek keys lê hat,kirasê bi bendik ê ku li ser pişt vîzal vîzalî derxist parçeyên kiras di terikan de bi cî kir.Avê delav girêda.Kûsiyek,gêreyek,darîkek,pelek hişk,bi tevî kaxiza ji bêrîkê de avêt nav delavê;çav ne pel ne kûsî ne darik ne jî gêre didît,her ku xêz li kaxiz reng belav dikir wî deng

li xwe dikeland,xêzên bi tirkî hatibûn nivîsîn wek gîsnê cot di hişde xet reş dikirin:"Em dizanin ku welatek me heye/dibe ku wextê me ev rastî dît

hemî yezdan reş girê dan/silavek me ji bo yezdanan jî heye/emê li wan jî biqîrîn bi gotinên bi êş û janê hatine şuştin/"

Waxtê rastî lê dibarî hemî sozên li dil dax dikir lê dibûn teyrên baskşkestî û difuriyan;çarsed kes ji gund koçberê Ewrûpa bûn û ji çarsed kesî çar hezar soz li xaka gund wek tov vereşandibû lê wî dizanibû bê ka xak çawa reng li însan dadipalîne.

Ji taldeyê de çawa riya li pêşberî gund lê xuya kir çong lê sist bû;du ga û li du wan du peya,orîna çiya ku ji evseneyan de lê bûbû nalîn bi ser ket...Çûyîna navçeyê lê herimî bû.Li baniyê gund li gund zivîrî,tu car ewqas ji dil û can banî, newal, çem û sikakên gund nedîtibû. Bê hemd çav li goristanê zîq rnan.Xêlyek sor her ku bê sivik ew dihejand jî li ber çavên wî xêlî wek peyayek ji govendê derbikeve û tûtin bikişîne,dixana ji tûtinê lê bû hewrek reş reş wek qîr ...

Li ser zinarek piçûk weke di zaroktiya xwe de rûnişt,kevir dîsa di bin de wek hespek hêşpêlî bû;piçûktiya xwe de jî ew hevalên xwe li ser kevir rûdiniştin,li benda yezdan diman ku ruh bide hesp î wan ,piştî hêvî ji xweda dibirîn hesp bi çargavî di bin wan de dibezîya,wan bi xwe ruh didayê ...

Sê kevir weke leşker bin li dû hevudu rêz kir,kevirek weke ku qazî li pêşwan,ê weke mela jî da pêş qazî ... Ev lîstikek bû.diviya beriya ku însan, bi kevirên diavêje , leşkeran wergerandiba, dû re qazî dawîya dawî jî mela ... "Kêma ma "got û kevirek dî jî da pêş gişkan,ew jî gayê ku destê bav li ser dikelî bû.Çend kevir di hembêza xwe de kom kir, çend gav ji leşker,qazî,mela û ga dûr çû.ta tê de hebû kevir avêt mela, dû re avêt qazî û di dawî de leşker û ga bêyî wergerîne dest ji lîstikê bereda,carek dî li gund nihêrî,hêsirên germ li ser ruyê sar weke dilopên civa yê gilêr dibûn. Li ber kevirek bi hineya siruştî rûnişt.Çîpên dirêj bê zevt bereda,enişka milê

çepê da erdê,destê çepê da ber hinarika rû û tifu ser hineyê kir û bi keviyek piçûk tevda;qirik lê ziwa bûbû,li ser kevir hine sor dikir. Kevirek pan ku ji wan keviran re sal dihate gotin da ber xwe,bi tilîkê hine li ser sal neqîşand.Wêneyek dêwek heftserî ku di dev de serê heft keçikan ... Pora keçikek şibandibû pora diya xwe,qehweyî û zirav ,dişibiya hiriyê.Bi cixareya sisiyan re wêne li ser sal ziwa bû.Ciyek bi nîşan kifş kir,sal serdeverû di wir de veşart ,serî da zinarên asê ên li rojhilatê gund diket. Wek kesên vî gundî û bi hezaran kesên navçeyê xewn û xeyalên bi gencîneyan dewlemend bûn li wî jî heya wê demê bûbû hevî.Çîrokên ji talana mayîndeyên dîrokî re dibûn sedem, weke pirtûkek bênav di dilê herkesî de bû. Li navçeyê û gundên navçeyê hê jî Ermen dijiyan.Her ku ew bi kurdî diaxivin û weke kurd dijîn jî kesên

[www.amude.de](http://www.amude.de)

5

navçeyê malbat bi malbat wan dinasin.Li gorî çîrokan Ermenan hemî nirxan di goristanan de veşartibûn û ji boyî ku şika kesên misilman venekişînin navê "şehîd" li wan goristanan datanine!Lê kesên misilman bi sedan goristan vekolandin,bi dehan"goristanên şehîdan jî" serobinokirin ... di pêvajoya şer de kes ji tirsan bi şevê dervediket lêgerînê.

Hadî û hevaleyê xwe jî ciyek bi nîşan di zinar de dîtibûn.Li wî cîyê nîşanên xuyange hebûn.Di dest hevd de sond kiribûn ku dê tucar bêyî ku hay wan ji hev tunebe dê kesî dest neda wê deverê. Hevalê wî bi beriya du salan çûbû Fransa.Ji dil hat ku careke dî serî li wê deverê bide.Ji nihade xwe amadeyê pirsên hevalê xwe

ên li Fransa dikir.Ew wêne çêkirin û di wir de veşartin jî ji ber vê xema ha niqutî dilê wî;Ermenan ji xwe tiştin li vî welatî veşartibûn,wî jî wêneyek bi

hineyê ji xwe li welat dihişt!Di rê de kenek bi xem di dil de dikelî;ku yek weke tesaduf pêrgî wî salî bihata!Dê karesetek bijiya."Na lo"got,"Ew incax goristanan vedikolin".

Hê negihiştibû ciyê bi nîşan li ser kaniyê rûnişt.Beriya ku ser deverû vezele û av vebixwe tûncika por ya dirêj da alî. Piştî av vexwar hinek li ser çongan

rawestiya. Derdora kaniyê xalî bû.Çend kevirên mezin gilêr kir ,anî hinda kaniyê.Li kêleka kaniyê weke sewkiyek bi cî kir.Careke dî li kaniyê nihêrî.Di avê de li wêneyê xwe nihêrî.Weke wêneyê wî kesek be li hember wêneyê xwe bê çare û bi şerm sekinî.Asîman weke ku çar buhust dûrî wî be.hemî kevir û ber lê weke hatibin ziman.Di çîrokên gelêrî de di demên wiha de çiya li însan fikir orîn.Weke ku orîn bibihîze xof pêket.Piştî meşa bi qasî çend xulekan gihişt ciyê xwe. Hertişt weke xwe bû.

Herku ewqas goristan hatibûn vekolandin jî kesên gund tucar dewlet ji wan

tiştan haydar nedikirin.Di vî derbarê de derûniyek bê beled bi wan re hebû.Li vî gundî li keloşkek deriyek dîrokî hatibû dîtin.Hemî kesên gund haydar in lê tu car ji bilî wan kes pê nedizanî. Hadî jî êdî bi girîngiya wan nirxên dîrokî dizani bû.Ne bi tenê bi girîngiya wan êdî dizani bû ku ew nirxên dîrokî bê ji karesetên çawa de dapalîne.Di wê kêliyê de hêviya dewlemendiyê lê sar bû.Wl ciyî jî weke ciyek ji rêzê di hişê xwe de bi cî kir û ket riya gund.

Nedixwest çav li tewleyê bikeve.Ku dîmena tewleyê ya bê ga dihat ber çav xwêdan bi ser diket.Însan wextê mirina îsanek dibihîse tucar hîs nake ku ew miriye.Bi awayek ew însan dijî. Hadî jî nedixwest bipejirîne ku herdu gê hatine firotin.Hê negihiştibû pêş mal bavê wî xwest ava ser birijîne ser hestên wî ê germ: ---Şikir ji vî rojê re,ez ji karûbarê giran xilas

bûm,de here tewleyê,di zivistanên dirêj û bi jan de şev û roj giha bikişîne ... Te ez xilas kirim;bi xêr ku tu biçî "derva"di salê de tu çend quruşan ji me re bişînî besî me ye,ême çay,şekir,cixare,ardu ,rûn û ard hebe bes e. Hadî bi ken li bavê xwe Sofî nihêrî. Sofî jî têgihişt ku bê ka Hadî bi ken dixwaze çi jê re bibêje;Sofî di gund de weke kesek rastgo dihate nasîn.Tu car ya xwe di dil de nedihîşt lê niha ji bo ku Hadî li ber xwe nekeve rê diavêt ber.Bi qasî rastgotinên xwe bi nefsekî û nefspiçûktiya xwe jî dihate nasîn.bejna bilind û qalind nedihîşt bi lez tevbigere.Giran zivirî ber bi Zerîxan ve:

--Qîzêê,me du ga firot,de ka lûkek bîne serjêbike.Bi van gotinan xwest reng li Zerîxan jî vebike.Lê tu gotin dilê Zerîxan nerm nedikir.Ji hêlek ve dilxweş dibû ku wê lawê wî biçûya û xwe xilas bikira,li hêla dî jî ji ber ku bi çîrokên ên çûbûn dizanî dil lê bi tepetep bû.

----Belqitîyê kûtî,derdê te û zik!Got û deng li Hadî kir.Were ez bi qurban,îşev tu mêvanê dayika xwe yî.

Hadî bê hal bû.Tu hal pê re nema bû ku rê bide henekên xwe ên meşhûr. Dest avêt deviya li ser dîwêr. Parçeyek jê kir û xist nav didanan.Li diya xwe ,bavê xwe û li deriyê xênî nihêrî.her ku difikirî ku dê ji wê hengê şûn de wê bav diya pîr bi tevî xem û êşên xwe di wê deriyê de biketana hundir dipelisî û piçûk

[www.amude.de](http://www.amude.de)

6

dibû.Xem li wan bender ,çûyîna wî jî mevşena bê didan bû.şîretên ku diviya li dê û bavê xwe bikira yek bi yek dubare kir:

---Dayê ,tu û xwdê tu êdî alaktirîkê girê nedî,binihêre ez ne li vir im,ku ji nişka ve serdebigirin dê hun perîşan bin,mereqan nekin ezê ji we re dirav

bişînim.Zivistanê bila yek ji te re nanî bipijîne .Bila bi heq be.bavo,tu jî qarişî xêr û xerabiya kesî nebe.Ji xwe re li nimêj û karê xwe bî besî me ye. Zerîxan sê roj bû ku kîsê şekirî nav lalîsa ji paşila xwe de derxist û xist destê xwe. Hadî her ku dizani bû dewlet ji bo ku gel vebikişîne nik xwe çav li girêdana alaktirîkê digire jî dîsa jî sêcar çarcar girêdana alaktirîkê bi bîra wan xist hê bi ken

li diya xwe henek kir:

---Dayê şekirên te di paşila te de bi kurt ketine an na got û dest avêt stuyê wê.Zerîxan bi dil tenikî lê vegerand:

---Min bizanibûya ku çavên min bi kêrî te tîn minê çavên xwe derbixista û ezê jî mîna Evdal bijiyama.

Her sê jî bi coş û xemek zirav re dimeşyan.Hêstrên Zerîxan li dilê Sofî jî bû kana histrên germ lê wî nedihîşt biherikin.Hadî dixwest ji dil û can van demên tije bijî.Çuriya rû ji sorahiyê wenda bûbû.Ji hêlek ve jî dilxweş bû ku wê ji riya girtîgehê xilas bûba.Piştî ketin hodeya rûnişkandinê hemî wêneyên li dîwêr bi wî weke bistiyanê dara bihokê ên bi berfê xemilî sar dihat.Herku bi dawiya vê rêwitiyê dizanî jî weke ku riyek baş be tevdigerî heya wê demê.Lê tewrên wî ên veşartok ew aciz dikirin.Pişt li sewkiyê ediland û weke dersdarek ji dê û bavê xwe re axivî: ---Bavo,hun jî dizanin nêzî çarsed kesî ji vî gundî koçberbûn.Ji vana nêzî dused û pêncî kesî çûn Fransa.Ên ku çûn û hatin dibêjin ew dever jî goleke gerînek e;diravên ku ji karkeriya avadaniyê tê wergirtin ku însan hebikek weke însan bijî tê xerckirin.Ku însan her roj erişte bixwe incex dikare hinek dirav berhev bike.

Nediwêribû hertiştî vebêje.Carna gotin di dev de tirş dibû carna jî dîsa dadiqurtand.Sofî li ser kursiyek textik tezbî di dest de dihênijl.Zerîxan çav li dîwêr bi gustîla di tiliya xwe de dileyîst.Di daweta wê de çar heb çarikên zîv avêtibûn stû.Piştî neviyek wê hatibû dunyayê ew çarik bi tevî morîkek



şîn dabû qîza xwe ku biavêje stuyê dergûşê.hew gustîlek wê hebû.Gustîl jî bi diravê ku ji hêkan bidestxistibû

kiribû. Bi lavatî hêvî ji Hadî kir.

---Ez bi qurbana te ez tiştêk ji te ra dibêjim tu xwe hirs neke;mirin heye mayîn heye vî gustîla min tike tiliya xwe.

Ji tirsê erdhejê hemî avahî ji daran dihatin çêkirin.Xaniyên vî gundî ji bêtonê bûn.Xaniyên bi tevahî sed mêtro bi serûber bûn ji kulîn,hol,alîmal,hodeyek raketinê û hodeyek rûnişkandinê ên piçûk pêkdihat.Ji ber zivistanên xedar pace du qat bûn.Paceya hodeya rûnişkandinê camek jê şkestibû.Hadî piştî ber bi paceyê ve meşiya şermkir ku paceyek nû nestandibû.Gotina diya xwe bê bersiv hişt û xwe avêt hembêza bavê xwe.

---Bavo, ez dizanim tu çiqas ji diya min hez dikî.Lê dîsa jî ez bi qurbana te tu dilê diya min neşikênî.Sofî rê diavêt ber.Ji hêlek ve jî di bin telik de serê xwe dixurand. --Babawo,tu ji minre pereyan bişîne per ... de wele ezê diya te bi kibab û zebeşan ... xwedî bikim ... li Zerîxan zivîrî hê dirêjahî da axaftinê,ew ji tama min hez dike!Bi tîrçîna Hadî re Zerîxan pekand ser Sofî.

--Ne şîn bi te şîn e ne jî şahî bi te şahî ye,ev çî ye tu ketî ber berçuvitiyan.Rêşiyên laçika sipî ji ser çavan de da alî,pêşa fîstanê gewr berhevki li bejna Hadî mêzekir ,bi axînek sar re û dîsa bi fedî axivî. Lawo ,riya te riya Resûlê Ekrem be te hay ji xwe hebe;dibêjin li wan deran hin qîz hene bi du xortan dikevin,dûra xwîna wan tevî xwîna xortan dibe ... lêv da ber gezan.Nediwêribû gotina mirinê bilêv bike.

Gund ji ber ku nêzî navçeyê bû xortên gund sal yanzdeh meh û nîv li navçeyê bûn.Hew bi qasî panzdeh rojan giha diçinîn(didirutin).Ji "mode"yê bigire heya bûyerên rojane û nêziktêdayînên ramyarî jî dişopandin.Ciwan rê û rêçikên pîran ên ji feodalîzmê

dipişkivîn nedişopandin. Ji her gotinên wan re, "erê" digotin lê her tişt bi ya xwe dikirin. Gotinên diya xwe li xwe germ kir. Carê di qehwexaneyê de bi qasî pênc kes li ser Fransa axivîbûn. Hadî jî li wan kesan bûbû mêvan. Jê yek ji ber ku bê destûr bûye ji alî polîsên frenewî ve hatiye şandin. Wextê ew kes bi van gotinan axivîbû her kesî guh lê fireh kiribû, "Waxtê li vir qala nav çîpan dikirin ez dîn û har dibûm. Ez çûm Fransa lawê metika min roya pêşî ez birim 'kampa tazî û rûtan' ... navdilê min lihevket, li ku bû ez vedirîşyam ... li ber wan mîna berate dihejiya ... mêranî bi min re nema êdî ... "

Helbet Hadî nikaribû van gotinan ji diya xwe re bigota. Lê pir bi xwe bawer wiha bersiv da diya xwe.

---Dakilêê, ma li wir jî însan hene ,jiyan heye, ne garan e hema kî bi dest kî ket, evqas xem û êşên me hene ...

Sofî dest da ber xwe, rabû ser piyan, bi kêleka xwe girt, "oyy oy" got dest bi dia û lavahiyan kir, "Kurê min ,ez niha bi dilê paqij diçim destmêj digirim û nimêj dikim. Hêviya min ji rebê min ew hêviye ku tu car kevir li ber nigê te nakeve." Zerîxan dengê xwe ê nerm hê nerm kir.

---Tew nimêja te, li tayê te neyê tu xwedê jî nas nakî!

Herduyan jî çiqas rexne lihev bikirana jî bi hezkirineke mezin hevudu dihewandin. Sofî çiqas hêrsbiketa jî gotina xwe ya weke, "Bêbav" bikardianî. Niha jî bi wê gotinê destpêkir, "Bêbavê tişt ne rast be ezê çima dest daynim. De wele rastî li zora xwedê jî here ezê bibêjim.

Bi çirîna deriyê der ve re Zerîxan mîna ku ji bin bar derketibe bi baleke sivik û bi tewrên asan ji Hadî re diaxivî:

---De îja ji diya xwe ra bibêje ez qey çî bikim çantê te?Ka ez ji bîrva nekim,beriya her tiştî van şekiran bikim bêrîka çante ... Got,bêyî li benda bersiva Hadî bimîne,"ya Goşkar Bava" got û rabû serpiyan.

Tîrqîn bi Hadî ket."Dayê te got ya kî?"Goşkar Bava li Navçeyê weke rûmetdarek Alewiyan dihate zanîn.Zerîxan bê xem û bi van gotinan însanetî da pêşiya hertiştî.

---De kî dibe kêfa wî ye,însan însan be bes e ... Hadî diya xwe li hembêza xwe şidand.Bi bêvila diya xwe girt û bada.Hêsir bi çavên wê ketin lê wê dîsa jî "ay" negot.Bi destê Hadî girt tiliyên wî yek bi yek xist devê xwe ,ji dil û can maç kir.Ji hêlek ve jî xemên xwe derdikir.Heya niha min bi dest û pêşa xwe da berhev.Ka çer bû.vaye tu jî diherî.Giş ma bêxwedî.Çend tas û kevçiyên aleminyûm ên di nav qartonî de rê Hadî da.Ez bi qurban ez dest nadim vana heya tu bixêr hatî.Tu û jina xwe pevre di vana de dîz bixwin.Li dû gotinên diya xwe Hadî careke dî çav li hodeyê gerand.Çend qat

nivînên ji hiriyê.Li ser refan du quşxaneyên dor lê reş,çend kevçiyên qela lê nemayî,kevçiyek darik.Li erda malê cilên gelêrî.Li her odayek sewkiyek. Li hodeya piçûk kewara ard.Li ser kewarê çewalek birxur.Hinek jî dan û serhêr.Kîsek piçûk ku tê de îsota hûr,pûnga hişk niha di dest Zerîxan de bû.Wê, havînê hemî masiyên ku Hadî anîbû paqij kiribû.Li ber tavê xwê pê werkiribû û hişk kiribû.Piştî weke ard hêra bû di kîsek naylonî de veşartibû.Zivistanê di rojên sar de hinek ardê masiyan tevî şorbeyê dikir.Şorbeya ku wê amade dikir nav û deng dabû.Dest avêt girêya kîs vebike Hadî pirsî.

---Dayê te xêr e?

---Haha,ez hema hinekê ardê masiyan bikim çantê te,carna tevî dîz û xwarinan

bike. Hadî dît ku wê hê gelek ew û diya xwe hevudu bibin û bînin kurt birî.

--Dayê,ku tu naxwazî dilê min biêşînî ,bihêle ez çanteyê xwe amade bikim.Dest avêt gustîla wê ,gustîl xist tiliya xwe.Bi vê tewrê re mirazê diya xwe bi cî anibû.Zerîxan bi dilxweşî ket riya derî ku biçe qût bide lûk û mirişkan.Hadî hew paxav bi gustîl xistibû.Du şapik,du îşlig ,du derpê,hevalkirasek û fanireyek xist çante.Derpiyê ku diya wî bêrîkek pêvekiribû datanî ser gişkan.Wê diravên zêde bixista wê bêrîkê û devê derpê toplî bikira. Hemî hodeyan se kir bê ka pirtûk,kaset an jî reşbelekên ku ji bîrve kiribe hene

an na. Beriya du rojan hemî kaset û pirtûkên xwe dabû hevaleyê xwe.Çend roj bû ku

[www.amude.de](http://www.amude.de)

8

nedixwest dildara xwe bi bîrbîne jî kaseta niha di dest de dildara wî bi bîra wî anî. Dildar a wî li navçeyê dijiya.Kaset weke parçeyek pembû di dest xwe de mis da.Li ser

çongan tûnd da. Dengê peyamê ji tîlefona bêrîkê de hat.Peyam ji hevaleyê wî bû ku ew jî bîst roj bû ketibû rê lê tu car fersend nedîtibû ku derbas be. Peyam bi kurdî bû."Riyek baş heye,bi tirê lê pênc hezar mark lazim e.Her rê bûye riya gû,neçe Stenbol,were Îzmîr ... "

Piştî êrişa 11 Rezberê gelek refên ketibûn riya Ewrûpa nikaribûn biçûna.Di gund de beriya Hadî şeş heb ciwanên dî jî ji bo ku biçin li Îzmîr bûn.Kesên di navbera Arnawit û Îtalyayê de fetisîbûn jî li navçeya rê dabûn xofê. Bêyî wan şeş kesan di wê demê de tu xortek ji panzdeh salî mezintir di gundê sed xane de nemabû.Ne fetisandin ne jî êş û derdê di rê de an jî êşên li Fransa bandor li Hadî nedikir. Ew di wê tatîrê de bû ku pere bi dest şebekeyan biketa û ew jî neçûba .. !Ev îhtimal di dil de bûbû bahozek geliyan.Gerçî herkesî rê li vî îhtimalê birî bû;li navçeyê pere

datanîn nik zêrevanan.Hew kesê diçû bi qasî sêsed mark li ser xwe dihişt.Ku peya biçuya Îtalya kesên şebekeyan pere werdigirt.Raîç û buhayê çûyînê di wê wextê de sê hezar û pêncsed mark bû.Pênc sed mark kesên ku ji wan re "eyaxçî" dihate gotin ku weke berdestên şebekeyan dixebitî digirtin.Pereyên dî jî digihişt serkarên wan.Pereyê Hadî çar hezar mark ghişti bû hev.Wî weke kesên dî pere dananî nik kesî.Sê hezar mark kir bêrîka bi derpê ve.Heyşsed mark kir bêrîka li ser hevalkiras û dused mark jî kir bêrîka şalê kot.Sed mîlyon lîreyê tirk dabû bavê xwe.Bêyî bavê xwe pêncî mîlyon lîre jî dabû diya xwe.Lê diya wî bêyî hay wî jê hebe ew pere jî dabû Sofî daku zexîre werbigire.

Nêrînên tevlîhev yek bi yek di hişê wî de vedida û ew sews dikir.Bi çepilê çante girt ta tê de hebû avêt dîwêr û derket derve.Sofî neçûbû destmêjê.Wî lûk serjê kiribû û Zerîxan jî di kuçik de agir vexistibû.Roj li ku bû çiya diavêt paş xwe. Qirçîna darikan ji agir dihat. Sofî ku çav li Hadî ket kêr di kevir da daku tûj be. Bona rê li axaftina Hadî bigire riya kar rê wî da.

---Ka xorto tu jî tenekeyê dayne ser agir bila gemarî pê re nemîne. Hadî gotina hatibû ber dev ranegirt.

--Te dîsa bi ya xwe kir ne,carê tiştê bidaliqe hişê te ma îmkane ku tu bi cî neynî ... Giş pevra kenyan.Piştî goşt avêtin ser tenekeyê bêhn belav bû.Zerîxan ji ber bêhna li cîranan belav dibû bi xem bû.Bi dengê nizm .

---Piştî pijiya hinek bikin tasê bidin mele,got lê ji gotina xwe poşman bû piştî bersiva Sofî.

---De ez bikim devê mele,çi mele ye çi hal e lê,maeşê wî heye,qurana wan bûye kaxizên ji jor de tê ... Dêlva wî de bide rebenek dî.

Hadî darikê di dest de kurusan nav arê bizot .Hinek jî bi gazind rexne li Sofî girt.

--Bavo, tu jî heya neçî serdaniya nav çîpên xwe tu gotinê nabêjî,şerm e xwedê jê razî ...

Gund li kaş û berwarek ne asê hatibû avakirin.Ji ber lehiyên biharê xetek li axê vebûbû.Di wê xet û şaxê de zarokek bi lingan ve ketibû nav heriyê.Bi girîna zarok re Sofî deng li xwe bilind kir.

---Qîzê qîzêêê,lelawo ka kes tune ye rebenê ji wê heriyê xilas bike?Ew hê diaxivî Hadî ghişt keçikê jî.Hadî keçik nasnekir. Ew da ser herdu destê xwe û ber bi kuçik ve meşiya.zerîxan çav li keçik ket bi çav û biriyan ji Hadî xwest ku zarok berede daku ew biçê.Hadî metelmayî pirsî.

--Çi ye dayê,ca ewqas tema nebe ... Wî ji diya xwe fêm nekir.Zerîxan bi hinceta goşt tev bide nêzî wî bû û bi pistepist şîret lê kir.

---Na berxêm na,ez ne di tatîra citiyek û parçeyek goşt de me,ew zaroka Fermalî ye.Wî û bavê te wê rojê hevudu rezîl kirin .Bavê te pê bihese wê îcatan bike!Kenek bi deng bi Hadî ket.Hê Sofî li wî nezivîrîbû,raza diya xwe teqand.

--Bavo,tu pê dizanî ev zaroka çarsalî dijmina te ye!

Sofî xwîna bi kêrê ve mabû jî bi paçikê li ser bistiyê dara sipîndarê paqij kir û bi sergêjekî,"Hêêê" got û li keçikê nihêrî.Bi bertekiya Hadî dizanibû.Lewma jî xwe li gotinê nekir xwedî.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

9

---De xwedê bela xwe bide Fermalî,eh ne tu însan e lo.Carê tevir û bivirê xwe li xerabiyê daye.

Gotina "mexso" gotinek biwêjî ye ku li gund ji bona kesên ku şelafiyê dikin,li dû lalosî û ewantiyê ne dihat bikaranîn."Mexso" got.Parçeyek piçûk ji ser tenekeyê wergirt û da dest keçikê. Dilê Hadî de ma.Wî rahişt citiyek mezin û da dest keçikê û şîret li keçikê kir.

---Viya jî li mal bixe nav nan bixwe.Ji bîr ve meke ,bibêje kalo Sofî da min!  
Gotina dawî li xweşa Sofî neçû,rexne li Hadî girt.

--Erê babawo,tu lawê Qulixan Beg ê yî .. !Qulîxan Beg serekê êlek li derdorê bûye.Hadî ne ku bi rastî hîn bibe bê ka qulîxan Beg kî ye,ji bo ku dilê bavê xwe asan bike pirsî. --Bav,ew kî bûye?

--Ez çî zanim,em bi serê gelean sond jî dikin lê em nizanin bê ka ew kî bûne.

Sofî di ciwantiya xwe de ji mala beg re çûye paletiyê.Heya êvarî ew birçî mane.Êvarî hemî pale li benda Beg mane da ku beg bê û ji wan re "eferim" bibêje.Ji xeynî Sofî tu kes neqehiriye . Bêyî ku destheq bidin wan di ser de jî melêveyek beg hatiye û bi ser wan de qiriya- ye. Paletiya ji beg re li gorî wî demê rûmet bûye.Ji wê rojê de Sofî li began bi nefret bû.Wextê peyva beg ji dev derket reng lê qimitî.

Li ser sifreyê Sofî û Zerîxan loqan di donê goşt didan,xwe bi wî awayî bilî dikirin da ku Hadî goşt bixwe.hadî jî her carî ciyê nerme dida dest yeki.Zerîxan ji hêlek ve jî weke lawo xwe bişîne rêwitiyek biveger li Hadî dinihêre.Xwe ji henaseyên axînan xilas dike.Di dil de dia û lavahiyan rêz dike.

Sofî bêyî nimêj bike bi pişîn serî dabû xewê.Pêşa sifreyê mabû di bin çongê Sofî de.Zerîxan nexwest wî şiyar bike.Çend caran hewl da ku bêyî wî şiyar bike sifreyê vekîşîne jî bi serneket.Wê dîmenê çîrokeke gelêrî bi bîra Hadî anî. Hadî bi dehan şevan bi guhdarkirina wê çîrokê re serî datanibû ser çongên Zerîxan û razabû.Hêdîka serî datanî ser çongê diya xwe.Ji bo wî guhdarîkirina çîrokê wê bîranîna herî bedewbûya.zerîxan tilî xist nava pora wî. Hadî nermerm,"dayê tiştêkê ma" got.

--Çi berxê?

--Çîrok ...

---Kîjan çîrok?

--Tu dizanî ..

Zerîxan dest bi vegotina çîroka ku bi humanîzmayê dagirtî kir. Di çîrokê de dêmariyek fen li keçikê dike; keçik rojek di xewn de bûye, dêmarî mar berdaye qirika wê. Her ku diçe zik li keçikê mezin dibe. Dêmarî nig dide ser stuyê bavê daku wê ji mal derîne, lewre li gor dêmarî keçikê zikê xwe tije kiriye, ango ducan û zîstan e. Bav jî keçik dide dest birayê xwe daku wê bibe li paş heft çiyayan bikuje û xwîna wê di pêjgîra xwe bide û jê re bîne. Mam keçik biriye. Keçik betiliye. Serî dataniye ser çonga mam û raketiyê. Mam kêr derxistiye lê dest neçûye wê bikuje. Bêyî kincê xwe ji bin serê wê vebikişîne pêşa kinc jê kiriye. Çivîkek kuşti ye xwîna wê di pêjgîr daye û zivirî ye ... Çîrok wanî didome.

Tewrên diya xwe şibandibû tewrên mamê keçikê ku bi hezkirinek tîr dagirtî bû. Çîrok hê neqediya bû Hadî jî ketibû xewneke şîrîn ...

Xem û derdên Zerîxan weke her carî piştî herkes radiket di serhev de dikeli; niha bixwe weke Xec, serê Hadî jî li ser çongan weke serê Siyaben , lê wê nedihîşt histir dapalin ser çavên Hadî. Herçiqas dibistanên wan ên bi zimanê wan, sînema, şanoyên ku ew temaşe bikin tunebû jî dîrokê hertim deriyê xeyalan li wan vekirî hiştibû; wê geh tayên pora hadî dişiband qirşikek di dev çivîkekê de geh jî dişiband ta ji çîmena li devê şaviyên zozanên Serhedê. Dia dikir; ji xwedê heya Melekê Tawiz, Ji agir heya tirîja rojê, ji avê heya perê Resûlê Ekrem ...

Çiqas dikewijî ewqas asîta li hûr û pizûr jan didayê; parçeyê nan kir devê xwe, weke mişkek bi diranên ku her yek ji hêlek ve parçe bûbû û reş bûbû pê ket daku bicû. Li Sofî nihêrî, hewl da ku şiyar bike lê dest neçû ... Wê û Sofî gelek tişt kevn kiribûn

[www.amude.de](http://www.amude.de)

10



lê hezkirina wan hertim ji wan re hêz bû;di gun de jî her du weke mînak dihatin

destnîşankirin.Sofî ku xewa wî hinek jî ji kaltiyê sivik bû bi hinijandinek re çav li

wan vekir.Weke ku liborîn bixwaze.

---Mîratê xewê li ku pêşkarî min bû.Hadî raket?

---Ez nizanim ji destê te herim kuderê,tuyê niha lawik hêşar bikî ...

Sofî dixwest êdî rê li diltenikiya wê teng bike.

---Qîzê de bes e ê te jî êdî,ma dergûş e,şikir mezin bûye êdî,ka li vir bisekine wê çi bike ...

---Wer nebêje,wele min bizanibûya rojek tişt nayê serî ,min parsa heft welatan bikira jî min ew nedişand der û dertûlên biyan.

---Me jî hinek zêde guh da qiseyên xelkê ...

---Malik li nifşa mezin xirab be;hun ji sibeyê heya êvarî li ser maseyan ne kar ne jî

şuxulek,qise li qiseyê zêde dikin.Şer di navbera dewletê û ciwanan de ye hun jî li dû heyfên xwe ên rizî ne ...

--Ez nizanim kî navê Hadî derxist piyaseyê.

--Ez çi dizanim,xwarziyê me îro bang li min kir,ji min re got xalojinê ez hêvî ji we dikim

hun lawik bişînin bila biçe,li ser maseyê çend ruspiyan dîsa tevn ji bo Hadî lidardixistin.

Sofî ji hêlek ve serî dihejand ji alî dî ve jî dest avêt sahana ku tê de goşt xwaribûn.Ji vegera ji alîmalê dengê bilind li Hadî kir.

---Rabe lawêm rabe,diya te dîsa sed kul û derd li hev rêz kiriye.

Zerîxan jî hêviya xwe ya ji dilê tenik birî,nedixwest bi vî hawî bandor li lawê xwe jî bike. Hêdîka dest li ser çavên Hadî gerand.Hadî ji nişka ve rabû serpiyan."Hun hê raneketine" got û çû avê biavêje ser çavên xwe. Derket

derve. Parçeyek ji cila kulerî avêt ser erd,pişt li dîwar asê kir û ji çavan de nêrîn beredan aso.Zerîxan hêdî hêdî derî vekir,bi lavatî,"Şev e berxê,m,însan çî dizane,hezar çê û xirab hene.Ji xwe ê te jî ma îşev"got û li nik wî rûnişt.Tebatî negirt.Cil û kincên şuştibû avêtibû ser deviyên li ser dîwarê di navbera rê û xênî de. Rabû çû yek bi yek dest da gişkan.Ên ku ziwa bûbûn hilgirt. Li gund tu kesî kelîşo ango kanên kîmyewî ên paqijkirinê bikar nedianî. Kinc dîsa weke her carî pir paqij bûn.Zerîxan jî gotina her carî digot dubare kir.

---Te ava gund ditiye,kinc wer paqij bûne mîna zêr dibiriqin.

Bi tenê ne kinc li vî gundî ne hewceyî diran şuştinê bû jî,diran li herkesî dibiriqî ji bilî ên ku cixare dikişandin.

Zerîxan kincên berhevkiribû datanî ber Hadî. Hadî dest avêt kincan ku bibe hundir.Zerîxan nehişt.

---Ka ez hinek dî li cem lawê xwe rûnê. Tişt bi kincan nayê.

Hadî cixare vexist. Bi axînek re rê da gotinan.

---Dayê ca li vî xweşiyê mêze bike,te hîv ditiye mîna tasek zêrîn tav daye çiyayê Leglegê.

---Me tu xêr ji vî gundî nedît,ma hun .. ?

---Li Fransa zarên gund li ciyek dimînin,navê wî ciyî jî "gundê jorê" lê kirine.

Zerîxan hinek dî nêzî Hadî bû.Kula di dil de mabû ji hadî pirsî;li gundê wan ê kevn bi qasî sed mêtro dûrî xirabeyan mey tek hatibû veşartin.Zerîxan her ku diçû gundê kevn av li goristanê vedireşand.Jê re dia fikir hê dihat.Çiqas çîrokên şer dihatin vegotin ew tirb bi bîra wê dihat.Ji kesên ku hê jî li gundên kevn diman ên ku bi wan beled bû ji gişkan pirsî bû bê ka kesî ewê/a di gorê de dîtibû an na.Weke mirazek mabû di dil de,navê wî/ê bizanibûya,welat,dê û bav bizaniba dê wê xeber bida wan.Deh sal bû ku

di dil de mabû. Weke cara dawî ji Hadî pirskir.

---Keko ,axir te tu tişt derbarê wê tirbê de nebihîst ne?

---Na dayê.

Ev bersiva kurt bala Zerîxan vekîşand lê bi ser de neçû. Rê li sohbetê guherand. ---Çiqas gundê kevn li xweşa însan biçe jî ev gundê ha pir xweş e, giş hêşinahî, av di hundir de. paqijî ...

[www.amude.de](http://www.amude.de)

11

Di erdheja beriya sî û pênc salan de weke hemî navçeyê li gundê wan jî gelek

kes miribûn. Di nav gund de çî bikirana jî di navçeyê de mêldariya hevudu dikirin. Beriya şer zevta wan li ser navçeyê û herkesî hebû. Weke gund hovber dihate binavkirin. Tu car raz û bûyerên di gund de jî ji kesên dereke re venedigotin. Di hilbijartinekê de berendamêk mebûsiyê soz dabû wan ku bihata hilbijartin dê ji wan re xanî avabikira. Ew însan weke mebûs hatibû hilbijartin û gund ji wan re hatibû avakirin. Di gundê kevn de jî hê bi qasî çîl xaneyî kes diman. Ku kes û xaneyên koçberkiribûn bihata jimaritn li ku bû şênî bi qasî şênîyê navçeyek bû. Piştî şer ciwan her adet û toreyên feodal datanibûn aliyek. Nakokiyek di navbera ciwanan û kal û pîran de xwe dabû der. Pevçûn nemabû. Beriya şer jî bi qasî pêncî salî bû mêr nehatibû kuştin. Gundên nêzî navçeyê hertim bêtir beriya şer gundiyên dûrî navçeyê şermezar dikirin ku wan ji bo tiştên piçûk mêr dikuştin.

Gundê ku niha ew lê dijiyan bi qasî du kîlômêtro ji navçeyê dûr bû. Êdî zarokên şeş salî jî bi tena serê xwe dimeşîyan û diçûn navçeyê. Bazara navçeyê û karûbarê navçeyê jî di dest wan de bû. Kesên ku nedixebitîn jî zaroyên wan ji Fransa ji wan re dirav dişand. Di gelek malan de êdî

qoltix,perdeyên sipî û tenik,heya makîneya kinc şuştinê,gezgezik ûmelkesên makîneyî hebû.

Di pêvajoya şer de dewlet jî bi ser gund de nediçû,di gund de beriya herkesî kesên ji jiyana feodal êş kişandibû an jî ne xwedî çov bûn ne jî xwedî dirav bûn piştgiriya welatparêzan kir.Ji malbata ku di gund de derbarê her tiştî de biryar werdigirt cara pêşî yek çû çiya.Li vir em dikarin bi bîr bixin ku di salên nodî de ji kesên xizan û bindestiya jiyana feodal jî wan perîşan kiribû bêtir kesên dewlemend û feodal bi awayên cûrbecûr piştgirî dan têkoşînê,lew re ew difikirîn ku wê desthilatdarî di demeke kin de bikeve destê kurdan û diviya ew ji desthilatdariyê bêpar nemana heta rasterast gere dîsa biketa destê wan!Dewlet bi ser de nediçû lewre dizanibû ku gund carê bi ser rê bikeve bandor li hemî navçeyê jî dike.Di hemî pîrozbahiyên gelêrî de ciwanên gund cî werdigirtin,li gund şahî lidardixistin.Di germahiya şer de ev wanî bû.Piştî ku şer hate rawestandin dewletê jî hêdî hêdî dest avêt gund.Di demek wanî de çar xort çûbûn çiya.Ev çûyîn ji bo Hadî riya Ewrûpa bû.

Ne bi tenê kesên vî gundî hemî kes bi tevî çanda ku sedcarî rû wergirtibû û jiyaneke xaîs jî herkes hertim li hember kesên ku ji bo wan ked dabûn bi rêz û rêçik bûn.Di Terteleya Şêxan de ji gund hinek kes hatibûn daliqandin.Ji ciyê ku ew hatibûn veşartin re ,Mezelê Kuştîyan dihate gotin.Ji piçûkan heya mezinan ew nav bi hurmet bi lêv dikir. Her bûyerek dîrokî bi tişteke hatiye remzkirin.Çîrok û janên wan bûyeran ji nifşek diherike nifşa dî.Carna jî bûyerek dibe sedem ku herkes carek dî rûpel li wan bûyeran vebike;beriya deh salan yek ku bavê wî di Mahaciriya Êris de wenda bûye li Edeneyê derket holê.lêzimên wî hê jî di gund de bûn.Weke bavê wî bi dehan kes wenda

bûne;hin jê li Ermenîstanê derketin hin jê jî li metropolên tirkîyeyê. Hadî û Zerîxan jî di siya darên sipîndarê de derbarê malbata navborî de

diaxivîn.Ji herçar zaroyên derketibûn çiyê jê yek jî zaroyê wê malbatê bû. Beriya şer jî kesên wê malbatê qarişî tu kesî nedibûn.Her ku malbatek berfireh bû jî tu car çavên wan ne li desthilatdariya gund bû.Piştqirî û alîkariyek mezin dabûn 'zaroyan'.Kesek ji wan jî girtî bû.Di gund de hin mezinan ji wan re ,"mala keran" digot!Vê navê ha jî ji mahaciriyê wergirtibûn;wextê Osmanî hertiştî tevlihev dikin Ermen êriş dibin ser wî gundî jî.Hemî gundî gund diterikînin,dibezin.Kesên wê malbatê gund naterikînin,ew baweriya xwe bi Ermenan tînin ku dê qarişî wan nebin lew re kirîvatiya wê malbatê û Ermenan jî hebûye. Hemî kesî malbatê dikin gomek û agir beredidinê!Ji malbatê çend kes hew xwe xilas kirine.Gundî jî hê jî ji wan bi gazin in ku çima tîn û hêrsa şer teneğihiştine û hatine kuştin.

Hadî carê dî bi diya xwe re van tiştan giş şîrovekir.Bi hêrs bû.

---Ew kes giş jî bê xisar in,zaroyên wan zaroyên hêjane,tu kes ji wan nebû sixur,çima evên mezin basa Serker nakin,ji camîyê dernayê lê ji sibehê heya êvarî di bin çengê kelemteran de ye.Ciyê ku însan tê de xweş be hertim xweş e.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

12

Gotina Serker ji alî ciwanan ve weke nav li kesên ku ne ji refên wan bû hatibû datanîn.

Zerîxan ji hewayê hênik xwe bi Hadî ve şidand.Darikê di dest xwe de avêt bin darê û axivî.

---Dibe ku kes bê xwedî bin,malbat bê xwedî bin lê dem û zeman tu car ne bêxwediye berxêm ... Carna hin însan li ber çav dibe mar,carina ev mêrê însan e,carna birayê însan e,carna jî xewnê însan e ...

Hadî dibistana navîn kuta kiribû. Ne bi awayek domdar be jî pirtûk dixwendin. Ji pirtûkan bêtir gengêşiyên wî û hevalên wî pêşî lê vekiribû.

Van gotinan bandor lêkir. Nêrînên di hiş de weke refek reşêlekan ku ji dengê bereyan fur bidin.

Ji daran tirîjên di nav sikakan de zêde ronahî nedida. Kesên li golik û zarokên xwe digeriyên ji tava heyvê sûd werdigirtin. Hadî û Zerîxan jî rabûn qanz, lûk û mirîşkan ber bi kox ve 'kiş'kirin. Bi serjêkirina lûkek dil lê asan nebûbû.

--Bav û bira, ez wê mirîşkê jî sor bikim di rê da bixwe.

---Guh medêêê, dayê, çer çawa be perê ga vaye di bêrîka min de ...

Ev gotin waxtê ji dev de derdiket qijînê jî ji dil de dihat. Zerîxan jî pê dizani bû. ---Ma ga ji te çêtir e, ême ma çend rojên li dunyayê. Ma kes bi qasî min û bavê te lebitî, ka dawî bû çî ...

Sofî di gund de bi alag a xwe nav û deng dabû. Di mêrga wî de kesî tayek li erdê nedidît. Miriyê mihan bû. Zivistanê daw li mihên wî qelew dibû. Her mihek wî weke çêlekek bû. Ewqas jî jîr bû. Ji vî gundî hîç heznedikir. Li gundê kevn xwedî bostan bû. Di kewarên fenî de mêşên hungiv xwedî dikir. Oelî, rûn, toraq, lovi, durmeyên goşt û kundir zivistanê di kulîna zerîxan de têr tije bû. Însanek merd bû jî. Lê merdiya wî bi tenê ne ji însanetiya wî bû; di gund de xwe bi tenê hîs dikir. Bi gotina gundiyan bê pişt bû. Tu car nedixwest bi kesî re pevbiçe. Carê neçar mabû ku pevbiçe, tu lêzim alîkarî nedabû wî. Zerîxan ji neçarî rahiştibû kevir û daran û weke mêr bikaranî bû. Ji wê rojê de bi herkesî re bi pişo pişo dem diborand. Piştî Hadî mezin bûbû jî vêca ji bo ku serê Hadî nekeve belayê dest ji herkesî re datanî. Vê deruniyê bandor li Zerîxan jî kiribû. Ji bo qirşek bi gotina Hadî, canê wê diçû. Lê tu car ji Hadî tu tiştêk teksîr nedikir.

Ji mirîşkan jê yek ber bi nava gund ve lez da xwe. Zerîxan ji bo ku ba laçik jê serî de neavêje koşeyê laçik xist dev û da dû. Bi hêrsketina Hadî re

zivirî.Zirze avêt ser qulpa derî. Darikek di ber re derbas kir. Kete milê Zerîxanê û meşîyan hundir.Waxtê derê pêş de dikatin hundir li ser derê hundir wêneyê Hadî ,li dor wêneyê wî wêneyên piçûk ên nasên wan hebû.Wêne bi hevîr bi qartonek ve hatibû zeliqandin.Oarton jî bi naylonek zirav hatibû nuxumandin.zerîxan bi coş lavayê wî kir.

---Heba hiş bi min re nemaye,qaşo min kiribû dilê xwe minê resmê te bigirta.

Hadî dest avêt cizdan,wêne jê derxist û da diya xwe.Zerîxan ku di azebtiya xwe de bi tilîka qiliç deboyê rûn bilind kiribû niha mîna lemê li ber hişkbûnê bû.

Zerîxan wê şevê du doşekên ji hiriyê avêt serhev. Her layifek jî li kêleka doşekan raxist ku bi şevê Hadî ji ser doşekan de ku biketa bila neketiba ser erdê.Layifek ku besî du kesan bû ji bona biavêje serxwe datanî ser doşekan.Hadî bi hemd xwe dirêj kir.Zerîxan destûr jê xwest ku tiliyên lingê wî mis bide. Hadî lingên xwe da dîwêr û li ser bir û anî. Hinek jî bi hêrs.

--Ha dayê,mêzebike nigên min çiqas rihet bû.temam?

Zerîxan kenek sar re şevxweşî dayê û çû.Beriya ku bikeve nav nivînan weke her carî yazmeyê lihev bada ,weke ben li serê xwe zexim girêda,laçik avêt serê xwe ;êdî hebên serêşê jî hukum lê nedikir.waxtê gore ji nig derxist nig lê weke hinarikên dergûşek bi tayê ketibe bi tîn bû.Tilî xist nav tilîkên nig û mis da.Êdî çermê nig ziwa û tenik bû.Ew ji xewê bêtir ji bo ku bedena wê asan be serî datanî.Carna ku bi bayê şevê re xwişîn bi pelan diket ew hêşar dibû.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

13

Li vê erdnîgariyê siruşt û ol tişte di jiyana însanan de bi cî kiribû,destê sibehê herkes şiyar dibû.Helbet wê sibehê beriya dîkê sibehê Zerîxan şiyarbûbû.Li pêş malê sivnik di dest de bi xişte xişt derûdor paqij kir.Mirişk,qanz û lûk beredan derve.Çû

kulînê to yê li ser mast berhevkir û kir sahanek.Nanê sêlê di tepsiyek piçûk de hur kir.Hebek sîr hejiqand û xist nav çortanê. Rûn û salçe qijiland berda nav çortan,dû re jî bereda ser nanê hurkirî.Ji goştê lûkê parçeyek nerme hilanîbû.Ew jî pijand.Cara pêşî bû ku ewqas den diavêt nav avê.Bi nav teştê ket çî nanê bê pijik û reşik hebû jimart.Sifre rêz kir. Destik jî datanî perê sifreyê û çû li ber serê Hadî rûnişt.Dest nediçû ku wî şiyar bike.Çend ayet xwen û pifê ser û çavê wî kir. Hadî çav lê vekir.Zerîxan bi lez çû hodeya ku têde razabû.Rahişt kirasê xwe anî rê Hadî da û dest bi axaftinê kir.

--Min ad kiriye ku tu bi ruyek ruspîtî derbas bibî ezê kirasê xwe bişewitînim.

Hadî pê dizan

gojî dikir,nîvê navçeyê alewî ne,hindik be jî Ermen ,çend gundên Çerkezan jî heye. Bêtir alewiyan rûmetek mezin didan xwendinê,bandora wan li misilmanan jî dibû.Du sûkên navçeyê hene û weke ,sûka jor û sûka jêr,tête binavkirin.Li sûka jor dikan û qehwexaneyên alewiyan,li sûka jêr jî mizgeft ,dikan û qehwexaneyên misilmanan cî digirin.Di meha rociyê de li sûka jêr tu xwaringehên vekirî tune ne,ciwanên misilman jî ji bo xwarin bixwin diçin sûka jor.Avahî ji tirsê erdhejê giş yek qatin ji xeynî hin dikan û avahiyên fermî.

Beriya şer destê esiran karmend û hin kesên hal xweş li texsiyan siwar dibûn û li ciyên seyranan araq vedixwarin.Li sifreyên araqê çandêke pêkeniyên derbarê navçeyê de pêşdeketibû.Di pêvajoya şer de



araqvexwarin pir kê m bûbû.Niha şer rawestiya bû.Hêdî hêdî dîsa di govendan de sifreyên araqê dihatin rêz kirin.Her ciwan bi hesreta govendê ye.

Hadî jî piştî ji dolmîş de peya bû li hevalên xwe geriya . Nedît. Li ser kaniyê dest da ber lûleyê bi keserkûrî av vexwar.Li herdu sûkan du car piyase kir dev û devê kolanê de coho hebûn,ji hêlek ve jî dengê avê guhdarî dikir .. Li bajarokê bi axîn dinihêrî,heya sivînekên dikanên yek qat ên ku hêlînên teyr û tuyan tê de xuya dikir bala wî dikişand.Sûk hê vala bû.Ji dikana ku kaset dihate firotin dengê dengbêj zelal û qube bû.Çiqas dixwast sivik bimeşe jî laş lê giran bûbû.Roj li navçeyê şîrîn dibû.Weke ,a baş ew e ku ez siwar bim û derî li kela dil dadim,fikirî.Ber bi qerajê ve meşiya.Sofî çanteyê wî weke dergûşek dabû kêleka xwe.Çav bi Hadî ket rabû ser xwe û deng li şofêrê dolmîşa di rêzê de kir.

--Aha, vaye lawê min hat,ka ka wî qoltixî jê re vebiqetîne got.Qoltixa paş şofêr rê dabû.Şofêr,"Li ser çavên min xalo,hema bila dilê te xweş be "got û kursiyek piçûk li ser wê qoltixê berevajî datanî.Rêwî giş amade bûn.Li benda nexweşek mabûn.Şofêr li saetê nihêrî. Dema wî li ber kutabûnê bû.Mala rêwiyê nexweş pirsikir. Bilêtên di dest de da berpirsiyarê rêwingehê.Hadî bi axînek re xarê destê Sofî bû.Maç kir û da ser eniya xwe.Sofî pêşî eniya wî maç kir,dû re hinarikên ruyê wî.Di wê hewayê çiksayî de birûskek li dil û hişê Hadî veda;bi binavkirina wî delalîka ber dilê wî,bayê zozanan,kulîka rengîn,evîndara wî bi qasî bîst mêtroyî dûrî wî,li ber kaniyê weke ku li benda yekî be destan pevxistibû û bi nêrînên hawarî li wî dinihêrî.

Evîndara wî ji gundek dereke bû ku li navçeyê bi cî bûbûn.Yeka şonzdehsalî bû.Lêvên zirav,çavên zeytûnî,bejneke sivik,bêvilek piçûk û li rû hatî. Haya wê ji çûyîna Hadî hebû.Beriya sê rojan soz û biryarên xwe kiribûn yek. Hadî jê re gotibû ku bêyî xatir ji wê bixwaze wê biçe. Hadî

mîna mirişka serjêkirî pelpitî li ser qoltix.Çav lê tarî bûn.Seyran li ciyek wanî sekinî bû ku wê dolmîş di ber wê re derbas bibûya.Lê şofir ji bo ku biçe wê nexweşê jî bigire berevajî berê dolmîş da rojava.Seyran tilî xist devê xwe. Diran li goşt rûnişt.Li sûkê nihêrî.Zivirî ku çiyayek bibîne.Tu çiya pê ve xuya nedikir.Soz dabû diya

xwe ku dê zû biziviriya mal.Ku bavê wê Firîg pê bihesiya wê hêrs biketa. Biryar da ku wê biçuya mal, bi riya têlêfonê di ser Zerîxan de têra dilê xwe bigiriya.Lê soz,soza dabû Hadî ku wê tu car negiriya!"Girîn."got xwe bixwe,"Ma çi şerm heye di girînê de,serê me jî diêşe em derman dixwin,ma xwarina derman şerm e."Rê da hêstran.Lê hêstrên bê deng dil lê asan nedikir.Weke xezalek nêçîrvan li dû be zû bi zû meşiya.

Asîman li ber çavê Hadî dişibiya govenda cinan,tê de conega,şêr ,xezal,zebanî,dengê dergûşan,hawar,kenên çiriyayî,ba,baranek qîrî,çiyayên bi birîn,mirovên nivî kimyewî û dest bi çek ,xort û ciwanên li ser hespên sipî,kew û çivîkên bê serî,Xoce Xizir,pora hin jinan di destên bi xof de,qîrîn ...

xwêdan lê sar dibû.Dest da ser bêrîkê.Du kevirên saxsî ku weke morîk bûn ji kaniyê wergirtibû jê re bû hewînê.Dengên rêwîyan bi wî hêwirze bû.Bi sedan ba li hişê wî rabûbû.Ji zaroktiya wî de çi bîranîn hebûn weke kerengper û bistiyên tazî deng didan.Bi berstûka îşlik girt,bi sînga xwe ve zeliqand ku xwêdanê bikişîne. Halê wî halê perîşanan bûn.Şerm,poşmanî ji niha de weke dilopên qîrê di ser dil de dadipalî.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

15

Gihîştibûn ser Pira Evdîrehman Paşa. Pira dîrokî bi bûyereke dîrokî nav daye,Şêxseîd li ser vî pir hatibû girtin.Li keloşka pirê qereqolek hatibû avakirin.Her ku şer hatibû sekinandin jî herkes li vir di bin lêgerînê de

derbas dibû.Waxtê nasnameya xwe dirêjî leşker da hewl da ku şik venekişîne.Çawîş î pistor dirav da şofêr ku ji Mûşê ji wî re cixare û kaxizên 'lîstika loto'bîne.Ev lîstik li vî welatî dizê xeyalên kesan bû.Lîstika bi şens bêtir serbaz û leşkeran û karmendên biyan ji êş û tirsê şer hinek be jî xilas dikir.Ji ber ku wê ji çawîş re bianiyana çawîş jî bi navê ku di bin çiyiya wan de nemîne deng li

leşker kir ku nasnameyan bêyî ku se bike li kesan belav bike. Dil hinek li Hadî fireh bû.Lê hezkiriyên wî lê bûbûn bahozek,henaseyên dirêj û fireh ne besî dilê wî bûn.Rû lê sorahiya hewrên biharan.Hewl da ku her tiştî ji bîr ve bike.Serî da ber paceyê.Êdî dengê kesan dibihîst.Du rêwiyên li kêleka wî runiştî bi dengê nizm diaxivî.Jinika navsere gazin li mêrê xwe ê bi rû dikir.

---Hemin te em ji Îzmîr anîn vir te bihîştê em hinek li vir bimana,hîna gelek kes hebûn ku wê tevdira me bikirana ,magalonek penîr û postek toraq li ku besî me ye .. !

Zilam bi zimanê yekî oldar diaxivî.

---Bêbavê ma ne terş maye ne jî mêşin,herkes desteng ûê xizan e.

---Wele mîna qeyran û birçîtî li van deran tunebe.Li Îzmîr kes êdî bi hesreta pariyek nan in.

---Her malek îlahîm jê yek an dido li ewrûpa ne,bi qasî ku nemir ne jî bijîn pere ji wan re tê şandin.Heyra dengê defê ji dûr ve xweş tê,te lawê Cemîl nedît ji bo jiyana wan rebenên li Ewrûpa çî digot.

Van gotinan çiqas hinek be jî bala Hadî vekişand ser Ewrûpa jî dil ji bo heval û hogirên wî,dê û bavê wî dikelî. Şoreşê bi hêlek xwe bandor li herkesî kiribû ew jî ev bû ku ji dil û can nêzî însan dibû,bi hêla xwe ya însanî kesan di bin bandora xwe hiştibûn.Bîrdozî ne xema kesî bû.wan bi çavên xwe didît ku ew kesên ji bo mirişkek an jî qevşek giha mêr dikuştin

niha zaroyan wan li ber çavên wan bê berjewendiyên şexsî dimirin. Weke kevirek li peravê Mûradê bû ,bîranîn bi leme lem di ser de diherikîn.

Di otobusan de kes weke demên rabirduyê bi deng nediaxivî. Yekî sî salî ,xwedî riya sêrek, çend diran ji dev weşiyayî li hevalê hadî ê rêwitiyê bû. Bi dengê nizm pirs li ser pirsê ji Hadî dikir. Hadî bi berisvên kin dixwest pêşî li sohbetên duvdirêj bigire.

---Tu diçî ku?

--Îzmîrê.

--Baş e, ez jî diçim wir. Diherî xebatê?

--Na.

--Lê?

--Leşkerî?

--Niç.

--Kesên we li wir in?

--Hii.

Zilam van bersivan bi bê belediyê ve girê da lewma dev ji pirsan berda û derî li xemên xwe vekir.

---Ez ji gundê Tata me. Te navê Tata bihistiye?

Hadî bi wî gundî baş dizani bû. Gundek ku gelek welatparêz jê derketibûn. Dîsa jî Hadî xwe li warê tenêtiyê digirt.

--Erê.

--Tu qey çûyî wir?

--Na.

--Min zaroyên xwe ji bihar de şandibû gund. Ev bîst rojin ez hatime. Cinet çere ye gundê

me jî were ye. Dîsa mîna xemek ma di dilê min de.

Zilam axîn dikişand. Hadî bi bendikê i qoltixa pêş ve dilîst. Çar saet li rêwitiyê barî bû. Ji Mazrayê derketibûn. Ciyê sekirin û kontrolê ê dawî

mabû.Şofêr nig li pêpelûka firênê sivik kir. Leşker lehweya sor li wan bilind kir. Otobusê li kenarê rê da sekinandin.Duajo

www.amude.de

16

deriyê bagajê vekir. Kesî li nasnameyan nenihêrî. Leşkerek weke rruzqma serkeftinê bigihijine serbaz tiştêk di dest de ber bi qereqolê ve beziya. Leşkerek dî jî bi hêrs deng li rêwîyan kir û tûrikê di dest de rê da.

--Ev çante ê kî ye?

Yekî navsere ji kêleka hevala xwe rabû ser piyan û bersiv da. --Ê min e.

--Dakeve jêr.

Piştî pênc xulekan rêwî mîna piling bi hêrs ket hundir û bi dengê bilind diqirîya. --Tu li vê ecêbê binihêre,ji wî wetir karî kinf e!

Karî gihayek pelfireh e.Li Serhed biharan tê hişkirin.Bêtir ji bo berşoşk û îshalê ava wî tê xwarin.

Mîna hemî rêwîyan ken bi rê Hadî jî ket. Hewaya otobêsê û çavên ziwa ew li xewê germ dikir.Lê ew bi rik bû;heya herikîna Firatê nedîta wê raneketa.saet di pênc û nîvan de otobês li çiva Firat difetilî.Bi dest pace paqij kir. Dil lê asan nebû,bi enişka xwe carek dî pace paqij kir û li Firatê nihêrî.Çiqas ciyê ku lê derbas dibûn zuxur bû jî robar ker,lal û giran bû.Wê, bi ruyê şîn ,deng di çîrok û dastanan de bilind dikir. Ew, xwedî dastanek wanî bû ku di efsaneyan de dihate gotin ku wê bibe sedema şerek cîhanê.

Hadî di nav du xulekan de qutika dil vekir. Nizanibû ku Firat Seyran li dilê wî dineqîşand an Seyran Firat li dil dineqîşand.Ji Seyran bêtir Firat şiband çavên diya xwe;di Firatê de jî hêviyên kal,xezebek,di nihêrînên wê de jî agir,tîr ... Ji wî wetir Firat şerma wî dide ruyê wî.Serî serbest di ber xwe de bereda.Weke li ber bedewiya wê biçe secdeyê,çav jî girt û hemî xem

û fikaran di wê kêliyê de kilît kir. Weke ji Seyran hez bike bi rûnermî dihênijî.

Rêwiyê dî jî dev ji wî berda bû. Pirtûkek helbestan kiribû naylonek piçûk û li nik

xwe hiştibû. Li helbesta navdar ya ku bi "Ev çiya" destpêdikir digerî. Helbesta

helbestvanê navdar Ehmed Arif ducar sêcar xwend.

Hêdî hêdî tari diket erdê û her der radipêça. Saet di duduyê şevê de ew gihiştibûn navçeyek Sêwazê. Herkesî li wir xwarin xwaribû. Derketibûn derve. Piştî otobês bi rê ket tirîj tev de hatin vemirandin. Ew li qoltixê li pêş ya ne li paş şofêr rûniştibû. Şofêr dengê teybê ji hundir da birîn, hew hoparlora li pêş deng pê diket. Deng gelekî jî nizm bû. Wanî. derb û wesle dîsa rast hev hatibûn; strana ku Hadî pê re diheliya dihat gotin, di çewkiya , "Te we wez kuştim lê lê/bi çav û biryanan e." çavên hadî ji Firat û ji çavên dayika wî bi coştir bû. Ji jineke bi derd wêrektir hêstir gilêr dikir.

Fanêre ji xwe de kir. Nameya Seyran ya di bêrîkê de bi bîra wî hat derxist. Bi rumetek name ber bi çavan ve bir û xwend. Name bi tîpên tirkî hatibû nivîsîn lê çarin û hin çewkî bi kurdî bûn. Seyran reha jiyana wî bû. Beriya ku nameyê bixwîne kena wê ku hertim rexne li Hadî nerm dikir bi bîr anî. Weke sond û biryar li xwe girt ku wê hertim rexneyên xwe di kenan de derbikiriba. Ku pir hêrs biketa wê dîsa wek Seyran hew lêv lihev bitewanda. Destnivîsa ku dişibiya nivîsa mixî li ser kaxiz baş hatibû bi cî kirin.

"Keko qurban rêka Mûşê rê dikişîne

sola delalîkê min teng e nig diêşîne

Ezê porê serê xwe ji delalîkê dilê xwe re bikim sol potîn e

Çiqas tu werî xewa min ezê go bidim kilama Hesenîko û ya Huso û nazê.

'De wer were berxêm were

Seyran ji can li benda te ve,"

Name evqas kin bû lê ji bo Hadî bi qasî du pirtûkan bû. Herdu stranên gelêrî ên ku bi evînên bi nav û deng hatî havên kirin ,strana Aram ku hinek guherandibû wek kêrek ko li ser dil daçikîn. Xebatên wî Seyran bi tevî her du hevalên wî ên di bin çav de bûn di siya evîna wî de carna diman.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

17

Siya Xeyalan

"Bejinziravo mîne şiva bê kelemo Dilê min liyan e sê cara liyan e Tu hildayî ser darê û di bin te da dikin bibirin guliyên e Hîl rojekê te li min nedî bîne derewan e."

Ji dastana Memê Alan

Bejnzirav mîna şiva bê kelem bû. Dil lê liyan bû. Gelek kesên ku bîna derewan jê nedihat li vî bajarî di her gotinekê de derewek bi cî dikir. Basmane ciyê herî bi nav u deng bû ji bo kesên dereke; kesên niştecih ji wê deverê nefret dikirin. Ciyê hezar fen û fût tede tete lîstin ji wan ciyan bû.

Hadî xwe gihandibû ciwanên ji gundê wî bûn. Ji ber ku ew beriya Hadî hatibûn du heb ji wan da pêşiya Hadî ku wî bigerînin. Kesê şebeke şîret li wan kiribû ku pevne negerên dibû ku şik bikişandibana. Ji sewsiyê gujîn ji serê Hadî dihat. Nedixwest dilê wan bihêle. Hema dest bi pirsan kir:

"Hun ji bo çi heya niha ma li vir?" Her pirsê Hadî çar bersiv werdigirt.

Xalit-Lawo lawo, nepirse, wele çûyîna me zehmet e, rê giş hatine girtin. Şeko---Segbavan însan dixapînin, ha îro ha sibê.

Biro-Gere em îşev herin ...

Tekîn-Em li van deran gurî bûn, tew xwe nîşanê me nade, her carî tê me her yekî milyonek dide me, sed cara bi namûs sond dike û diçe.

Hadî-Ez çawa dikarim xwe bigihînim wî?

Şeko-Gere saet di çaran de were hotêlê. Te biryan bi wan re kir? Hadî-Na.

Tekîn-Eman eman tu pere giş nedî wan! Tu dixwazî bila Biro xeber bide xezûrê xwe bila ew mîna ketî! bikeve ara we?

Xezûranên Biro li Îzmîr rudiniştin. Ev fikir li xwe şa Hadî jî çû. Biro çû têlêfon bike. Hadî û ên dî bê serûber piyase dikirin. Li ber derê her xwaringehê yek diqîriya. "gel abi gel, doyabildigin qeder." (Keremke kek kerem ke, heya ku tu pê têt bî) "Ucuz, balik, quru fasulye. (Masî, loviyên hişk, malê erzan.)

Bi sedan kermêş li camekan di têtêşînê de bûn! Xwarinên di paş camekanan de xwiya dikirin run lê sar bûbûn. Her loviyek hişk hingiya mabû werimîbû. Hadî birçîbûna xwe ji bîr ve kir. Tekîn weke şîret, "nebî nebî ku tu li van loqanta nan bixwî, tuyê jardadayî bî ha, em ji xwe re nan digirin, hinek tamatêz û pêni besî me ye." got û dest bir ser milê wî. Nediya û halê ku ew tede dijiyan wan gişkan bihestiyar kiribû. Di ser halê wan de jî roja beriya wê rojê gundiyeke wan bi gotina wan bi wan re bêbextî kiribû; şebekeyan têlêfon dabû hotêlê ku heft heb biçin. Gundiyeke wan ku navê xwe Şakir bû bêtî ku xeber bide wan çûbû.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

18

Di nav wan de ê ku bêtir çavnas û sîyasî Hadî bû. Hadî zagona lîstikê ji wan re got.

---Derbarê wî de tiştên nebaş nebêjin, ji vir heya Fransa wê destê herkesî li ser qûna herkesî be, kî xwe xilas kir, hunbûna bi bawerim we jî wanî dikir. Gotinên Hadî çiqas bi wan rast dihat jî nedixwestin bipejirînin. Gihîştibûn kolana herî bi nav ku navenda Basmaneyê bû; ên sêlikên komputuran difirotin, ên têlêfonên destan, ên sol û şekalên kevn, ên cil û kincên kevn. Li



serê kolanê du heb xwaringeh hew xwarina bi navê melemen difirotin.Xwarin ji hêk û bacanên sor dihate çêkirin.Bi piranî leşkerê diçûn wê xwaringehê.Heya bê erzan bû.Rusipiyek ku li ser cilek kevn runiştibû,cixareya qaçax dikişand,li ser dest jî sakoyek kevn ku rê dida daku miştêrî bibîne bala Hadî kişand.Hadî bêyî tu tiştî bibêje,sako ji dest wî girt,dest kir devê xwe û maç kir. Kesê kal bi metelmayî li Hadî nihêrî,ew nas kir,ji kêf û şadbûna pelpitî.

--Wey ez bi qurbana te ,tu û van dera,ca ca,de hela rune ...

Ciyê ku Hadî runiştiba jî tunebû!Bavê hevalê wî ku haya kesî ji hevalê wî tunebû.Beriya du salan neçar mabûn ku koç bikin.Piştî pê hesiya ku wê Hadî biçe derve poşman bû ku ew rawestandibû.

--De herin kurê m,te hey dît ji nişkave di ser vir de girtin.Li kolanên wisa negerin.

Li hotêlê cî terxan kir .Hotêl di sikakên askor de bûn.Weke rêzêhotêl bûn.Şev bi mîlyonek lîreyê tirk bû.Li ciyên dî ji pêncan ji dehan kêmtir tunebû.Hola hotêlê piçûk bû.Tê de du sewkî ku jê re bi tirkî qenepe tê gotin hebû.Bêyî qenepeyan ji bo şêwirmend cî hatibû vebirîn.Li ser maseya şêwirmend santralek piçûk. Duqat bû.Hodeya Hadî li qatê jêrîn bû. Piştî şiyariya Şeko Hadî jî da hodeya wan. Ew hode jî li heman qatê bû. Di navbera qatê jêr û dîwar de valahiyek hebû û serê wê bi textik û naylonan hatibû girtin.Du jinikên navsere li ser tupê hêk diqelandin,du zilam jî di ser wan re sekinî bûn kutîna wan bû cixare dikişandin û sohbet dikirin.Ku kesên wanî li navçeya wan bigeriyana dê bigotina ,"Mitrib hatin".Tu miştêrî ne xema wan bû.weke ku di mala xwe de bin tevdigeriyan.

Hadî piştî çante danî hodeyê Tekîn derî li hodeyê qefiland. Biro jî hat cem wan. Li holê kesên runiştî bi kurdî diaxivîn.Jê yek weke bixwaze Hadî û hevalên xwe jî dengê wî bibîhîze bilind diaxivî.

---Na birayê min na,heysîyet û şeref bi şebekeyan re nemaye,ev bû mehek me em li van deran perîşan in,ma bi telaq ne ji zaroyên min ên hur bûna minê niha hûrê wan bereda erdê .... Niha perekê me bidana me emê biçûna mala xwe.

Gotinên wî kesî tu bandor li her çaran nekir lew re wan li navçeyê bi ketîl pere dabûn şebekeyan.Ji bo Hadî jî hew bîrxistinek bû.

Kesê ku herçar ciwan hatibûn teslîm kirin li Stenbol bû.Wî wan teslîmî yekî dî kiribû.Ew kes jî Çepexçûrî bû.Saet di çaran de hat wir. Hadî rewşa xwe ji wî re vegot. Bi sê hezar û pêncsed mark lihevkin.Lê xezûrê Biro nepejirand.Pismamek Tekîn li navçeyek Îzmîr mamoste bû.Tekîn têlefona pismamê xwe dayê.Kesê şebeke ku yekî ziktirş bû hema rahişt têlefone bêrîkê. Bi zimanek nerm û şîrîn destpêkir.

---Li çepexçûrî xwaringeha min hebû. Hemî şofêrên qemyonan min di nas in.Na na ,ez bi te beled im,qet bila tişt neyê ser dilê te,îro sibeh ez wî dişînim,piştî lawik çû Îtalya ezê werim çayek te bixwim,temaaam,min navê dibistana ku tu lê dixebitî nivîsî ...

Bi lez.

---Gelî xortan hun baş in ne,vaye li ber çavê we ez çiqas diperpitim,meraqa nekin.Got û çû.

Piştî pismamê tekîn bi kesê şebeke re axivî bû bi Tekîn re jî axivî bû.Tekîn ji Hadî re rewş anî ziman.

---Ger em sê hezar û pênc sed mark li hesabê pismamê min razrrun.

Hadî , "Serçavan,em sibehê razînin." Got.Şeko bi sergêjî hêrsa xwe derkir.

--We se dît,wîlawo,dîsa pişt da me û çû.ka gere îşev em bi rêketana .. !

Ji bilî kenê tu tişt nemabû di dest wan de. Herpênc pevra kenîyan.Kesê şewirmend ku salê wî nêzî pêncî bû ji halê wan re serî dihejand.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

Hadî û Şeko ber bi hodeyê ve çûn. Ji hodeya li kêleka hodeya wan dengê nifteyê hat, derî vebû, pêşî kesek por lê sipî û li dû wî jî çend kesên bi tewrên xwe bal dikişandin derketin. Şeko çawa derî girt weke razek kes pê nizanibe derbike, "Ewê Çepexçûrî jî ji viya re dixebite, serê wan ewê porsipiye." got. Hadî bê deng xwe avêt ser nivînan. Şeko weke bikeve mala matê. Hadî li gotinên wî gotin zêde kir.

--Ew jî bi yekî din ve girêdayîye, ê din jî bi ciyek din ve ...

--Tu ji ku dizanî?

--Ma tu di guhê ga de yî; de bide ber çavê xwe carna di rojê de bi hezaran kes derbas

dibin, pereyê li meydanê, ma ev îş û karê zaroyan e ..

Şeko jî li ser nivînan rûnişt. Serê xwe kir nav destên xwe zîq li erdê nihêrî.

Hadî raketibû. Şeko rabû û derket. Saet nehê şevê bû hê jî Hadî şiyar nebûbû. Hevalên wî nanek bi tevî bacanek sor ji wî re hiştibûn. Şeko dixwest ku wî şiyar nekin. Tekîn hêrs ket. ---Ma hingiya hatiye pariyekek nan nekiriye devê xwe, Biro tu û Şeko biçin hodeya dî rabikevin. Em jî li vir.

Biro û Şeko derketin. Tekîn ew şiyar kir. Çavên xwe mis da. Diya wî bi bîra wî

hat. Hewl da ku biçê têlefona bike, nedixwest hest li diya xwe germ bike. Tekîn nan û bacan li ser parçeyek rojnameyê rêz kir. Îskanek plastîk jî bi av dagirt û datanî ber. Herdu hevsal bûn. Li gund, Tekîn herku bi dil ve bi wan ve girêdayî bû jî ji tirsê dê û bavê xwe newiribû bi wan re bi hevalî bigeriya. Niha serbest bû û dixwest bi siyanet û rumet wê şermê ji ser xwe rabike.

Hestiyariyê hinek cî dabû dilfirehiyê. Dil lê ji birçîna dixewirî, nan da ber gezan, bacan parçekir, jê parçeyek dirêjî Tekîn kir. Tekîn sipasî dayê. Di pênc xulekan de nanek sax xilas kir. Her ku qirik lê ziwa dibû av vedixwar.

Derket ku biçê dest û rûyê xwe biço. Ew jinika li ber tûpê bû hê jî li ciyê xwe runîşkandî bû. Hadî bê hemd lê nihêrî. Jinik bêhneke kûr li cixareyê da û çavek avêt

Hadî. Rû li Hadî sor bû. Bi lez derî vekir û ket hundir. Di tewrên jinikê de tinaz xwe dida der lê dîsa jî Hadî baş jê fêm nekir. Li hundir ji Tekîn pirsî. Tekîn hinek jî bi şîret deng bilind kir. --Îşê te pê tune ye, li van deran li ku ye însan li xwe dikeve şik û gumanê. Te bala xwe neda serûçavên wê, qey jinik ji rojê xeyîdiye ... Ez doho bi rê de dimeşiyam, jinikek bi lez ji hotêlek li jorê fuarê bi lez derket. Li dû wê yekî bejin bilind, di stu de zincîrek zêr, derket. Wextê xwe gihand jinikê ez bi qasî sê gavan ji wan dûr bûm. Bêbav şîmaqek li ruyê jinikê da min got qey birûsk ji ber çavan pekiya. Rebenê dest da ser çavên xwe ku xwe jê biparêze lê wî bi pora wê girt û ew vekişand hotêlê. Ji niha de tirsek ketiye dilê min; van şaran li hêlek dibiriqin li hêla dî jî kêm û nêm jê diherikin.

--Bavê te qey li diya te nexist?

Herku hevsal û heval bûn jî Tekîn nedixwest bersiv bida. Mizmizî. --Ew mêr û jin in .. !

Hadî kenîya. Bi taybetiyek kesên xwe dizanibû, ku însan bi şermên xwe destpêbikira benda li pêş razên wan hildiweşiya.

---Di gund de bav û diya min ji alî hezkirinê ve bi tilîkan têne nîşandan, lê yekcaran dunya li wan teng dibû, diya min jî wek jinika ku te bas kir bê çare dima; şevê bavê min em giş ji mal kirin der, ji bona ku kes bi me nehese em neçûn malên cîran û lêziman. Sar bû. Diya min nan pijandibû. Tendûr hê germ bû. Me gişkan nigê xwe kir tendûrê. Ji tirsê em nikaribûn biçûna mal ku me cilek bianiya biavêta serxwe. Pişt li me gişkan bûbû textik ... lê rast e, rastiya dê û bavê me û vana jî ne yek e ...

Tekîn gotin ji devê wî girt.Li gund bi tevî ewqas derfetan tu car kes li ser tiştên wanî nedixivî û nedifikirî.Niha li biyaniyê ,li hodeyek hotêlê pevra parve dikirin.

---Ez pir ji xuyek bavê xwe aciz dibûm,diya min pir dixebitî,bavê min perê şîr digirt,berx difirotin,her roj diçû navçeyê.Weke kesek merd dihate nasîn.Carna diya min tişt jê dixwest nedianî.Şevê jî ber ku çixat li mal tunebû diya min dîz dereng xist,bavê min lê xist.Wê çaxê ez pir piçûk bûm.Min sond kiribû ku ez mezin bûma minê jî di dev wî re bianiya ...

[www.amude.de](http://www.amude.de)

20

---Tu hîna jî li bavê xwe bi hêrs î?

---Na,waxtê ez mezin bûm,birayên min mezin bû îja jî diya me pişt da me û bi bavê me

dida kişandin,niha jî dilê min bi bavê min diêşe.

Tekîn li layifê nihêrî.Kincek weke fanêre ku erzan kiribû lixwe kir,xwedê rihetiyê bide te got û serî danî.

Roja Hadî nû destpêkiribû;çav li dolaba ku jengê avêtibûyê nihêrî. Piştî demekê jeng li ber çav dişibiya şiklên ecêb. Destê xwe da pêş tirîjê ,bi siya dest nav dinivîsî li ser dîwar,wêne çêdikir!Waxtê destê xwe gerand pîrika li koşe bala wî kişand.Jeng,pîrik û gemariya li erda hodeyê bîna wî teng kir.Weke ku xwe piçûk bibîne.Rabû,goreyên xwe ên naylon ku êdî hinek peritî bû hilda,çû şuşt ,bi erda hodeyê ket û paqij kir. Pîrika li dîwar jî paqij kir. Pace vekir.Bi vekirinê re toz û xebar rijiya.Bi qasî nîvsaetekê xebitî. Gore avêt qutîka sergo û dîsa li ser nivînan xwe dirêj kir.

Hewl dida ku hest lê germ nebe.Di çûyîna wî de bi qasî tirsî girtinê û rewşa aborî nexweşiya wî jî sedem bû.carna dilê wî diêşiya.hay bavê wî jê tunebû lê diya wî pê dizanibû.Soz dabû diya xwe ku li Fransa nexweşiya

wî pak bûya,ewê bi qasî sê sal bixebitiya û dageriya.Lê dîsa jî arê dilê wî roja li ber ava bû.ruyê wî jî di rengê hewrên di asoyê de.

Hefteyek li hatina Hadî borîbû.Çiqas biçûna gerê jî ji wan yek weke nobedar li hotêlê dima.Wê rojê jî Şeko mabû li hotêlê.Waxtê Hadî û ên dî ketin hudir b hêrs pekand ser wan. ---Hun li ku man,zû çantemantê xwe bigirin emê herin.

Bêyî tişt bibêjin çante wergirtin û dan dû Şeko. Kesê şebeke navnîşan dabû Şeko.Li texsiyê siwar bûn.Li ciyê hatibû kifşkirin şebeke dûr sekinî bû.Xortek dî li nik wî bû.Wan ji xort re destnîşan kir.xort,"Merheba ji we re "got û da pêş wan.Ew birin malekê.mal weke koxek li ber hilweşînê bû.Bi tirkî ji avahiyên wanî re,"Gece Kondu" tê gotin.Bi tevî wan bîst rêwî bûn.Kebaniya malê bi destek bi çepilê zaroya pêxwas û paşvala girt,weke biavêje

paş derî kişkişand daku cî ji ên hatî re bimîne.

Şebeke şîret li riwêyan dikir.

--Têlêfonên bêrîkê bi we kî re heye daynin vir.Netirsîn,ku hun bêne girtin jî wê dîsa we berdin,hun li ku bin jî emê xwe bigihînin we,di keştiyê de wê bi sedan kes hebin.Hun hertim lihev xwedî derbikevin.Ku hun hatin girtin, eman eman ,navê me nedin kelemteran,tiştekan wanî be wê him hun him jî em têde biçin.

Hadî bi pixkîn dikenî.Şeko niçindan wî ,"Çi ye tu ji bo çi dikenî?"

--Bi derewên wî,ma hay kelemteran ji wî tune !Navê wî bête dayîn wê hinek dî baca zêde bide.

Hadî jî têlêfona ji bêrîkê de derxist ,kart jê derxist û şikand,têlêfon danî meydanê. Deh têlêfon hatibû berhevkin.Her ciwan weke zaroya xwe biavêje devê gur xemgîn bû.Di demekê de cixare kişandin çawa ji bo wan dihat wateya mêraniyê ,di van salan de jî têlêfona bêrîkê dihat heman wateyê.

Hemî jî kurdên bakûr bûn. Herkesî bi çav li hev dinihêrî û dixwestin ji hev tişt fêhm bikin. Hadî dest avêt zaroya li paş derî û ew hembêz kir. Di stu de morîkek şîn hebû. Dest avêt morîkê keçik bi pora wî girt û kişand. Pirqîn bi herkesî ket. Bavê keçikê xwe hewceyî derbirînê kir.

---Nexweş e. Çi dibêje em xatirê wê naşkînin, tebera bûye. Keys bi dest ketibû ku perde vekîşînê ser rewşa xêniyê xwe jî. Li van deveran bijîşk pir bi buha ye. Bi milyar dirav li vê keçikê çû. Min li ciyek pir xweş ed kiriye. Bi xêr ezê sala pêş me xêniyek ava bikim.

Ji bo rêwiyan tu watyea van gotina tune bû. bi ser de jî herkesî dizanibû derewa dike. Waxtê şebeke rêwî li mala wî dikirin mêvan hercarî bi qasî pêncî mîlyonek didan wî. Carna ku mêvan bi şev diman jina wî ji neçarî li derve ciyê ku ji bo kuçik hatibû lêkirin, cilek diavêt ser xwe û li ser çongan radiza. Hadî hê jî yekcaran li çavê zarokê dinihêrî. Di çavên wê de kurahiya Firat û nêrînên Seyran didît.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

21

Şebeke derketibû bi tavî mazûvan. Hadî li ser u guhê rêwiyan dinihêrî. Bi berpirsiyarî şîret li wan kir.

--We kinc û cilên sîpor jî bi xwe re aniye an na, bi vî halî wextê li Îtalya hun ji kampê birevin wê bi kincê we bizanibin ku hun koçber in. Hadî dît ku axaftina wî li xweşa gişkan çû hêz wergirt. Di keşiyê de jî tiştêk bê serê me xwe şaş nekin. Em giş lihev xwedî debikevin. Ji rêwiyan jê sê heban tu kincê sîpor bi xwe re neanî bûn. Ji çend heban jî, ji bilî markên hatibûn wergirtin, bi navê xwarina di rê de sed mark hatibû girtin. Hadî hinek bi hêrs.

---Ma hun neçar in ku baweriya xwe bi herkesê bi her gotinê tînin.Ma ne xwarin jî li ser wan e.We ji bo çî sed mark da wan.Têlêfon jî ji me standin.Ne mîsoger e ku em diçin

jî.

Ji rêwiyan jê yek made li xwe tirş kir.Ew kes gundiyê şebeke bû.Lê xwe aşkera nedikir.Ji rewşa wî kifş bû ku gundiyekek kal bû.

---Na na,pir însanek dirust e,pê piştras bin.Pariyek heram naxwe.

Hadî hew bi axaftina wî kenîya.

Saet di heftan de mazûvan çend nanê patî ku jê re lewaş jî tê gotin,bitevî tepsiyek burxur danî meydanê.rêwî bi ser ketin.Hê kevçî di dev wan de bû şebeke ket hundir.

---De zû bikin,dolmîş vaye li benda we ye.Çav zincîrek zêrîn ku di stuyê rêwiyekek de bû ket.Xwe ranegirt.Wê zincîrê bi xwe re nebe,di rê de ji Afganiyan bigire heya Îranî û iraqiyan kesên degîşik hene.Ez li ber zincîr nakevim,tirsim ku tişt bînin serê te.

Xort bi madeyek tirş û bi nêrînek bi xof li çavê wî nihêrî.Şebeke xwest rê li axaftina xwe biqhere.Xort destûr nedayê.

---Ew kesên ku sê çar hezar dolar dirav didin we paxav bi vî zincîra çend quruşî nakin.Dîsa kesên Îranî û iraqî jî tunene. Em dizanin bê ka ew jî kî ne.

Rû li şebeke sar û sor bûbû.Lê ew hîn bûbûn.Yek caran bi serî ve li zinaran diqelibîn.Ruyê xwe ê reş veşart.

---Bi rebê alemê hun mîna zaroyên me ne, erê em jî ji vî îşî pere qezenc dikin lê em di ser we de jî dilerizin.

Xort bi dest weke dev ji van şelafiyên berde bibêje nîşan da û da dû rêwiyan dî.Bi tenê rêwî li dolmîş siwar bûn.Piştî du saetan li keviya bahrê bûn.Ciyek asê.Şev tarî bû.Piştî ji dolmîş de peya bûn yek hat pêşîya



wan.Navê şebekeyê wan got.Hadî "rast e" got.Ew kesê ku çav û serî lê mîna cin direqisîn,"Bidin dû min "got û meşiya.Li keviyê bi qasî pêncsed kesî kom bi kom bûn.Li derdora her komekê jî çarpênc kesên şebekeyan hebûn.

Bi tevî nediyarî û metelmayîne kêfxweşî jî ketibû dilê Hadî. Hercarî yekî ku li hotêlê

li dû ew kesê porsipî derketibû bala Hadî dikişand.Di komên dî de hemwelatiyên tirkiyê tune bûn.Hew bîst heb.Ên dî bi piranî Afganî ên mayî jî kurdên başûr û rojhilat bûn.Piştî hemî rêwî birin li keştiyê siwar kirin hê koma hadî birin.Ew mirov jî li keştiyê siwar bû.Mirovê bi kesê porsipî re eleqedar bû.Yekî bejind bilind,lawaz,riya wî zirav ,por lê gijik,û hew çend diran mabûn di dev de.

Xofa mirinê ketibû dilê Hadî û hevalên wî.Ew kesên di rê de fetisîbûn bi bîra wan hat.Poşmanî morala wan xera dikir.Ew kêlî ji bo wan doho,pêşeroj û hertişt bû.Bê xwêdan li wan sar dikir. Giş mîna mêşinên di germa havîne de bikevin kuyê.Şeko henek avêt ber. ---Lawo bi xwedê ez ji vê rêwitiyê re nabêjim amîn,ca hela li halê gemiyê mêze bikin,mîna hêlkana rizî,min bi xwe tu tişt jê fêm nekir.

Herkesê lihev dinihêrî bi ken silav li hev dida.Di navbera Tekîn û keçikek başûrî de sê kes hebûn.Ji kesên mîna Tekîn alûs û li ser xwe re li gundê wan ,tîtal, dihat gotin.Li hêlek keçikê mamê wê.Li alî dî jî jinepîrek nasê wan.Hingiya cî teng bû keçik

xwe zikepişt dikir.Tekîn ê li milê çepê tavn dida daku hinek cî ji keçikê re fireh bibe. Keçik ji hewlên Tekîn haydar bû lê xwe lê nedikir xwedî!Keçik bi dengê bilind bi van peyvan dest

[www.amude.de](http://www.amude.de)

bi axaftinê kir,"Belam ,ême ... "Tekîn fêm kir ku kurdeke başûrî ye.Ji bo wî êdî di keştiyêde hew keçik hebû.

Niha gundek li ser avê bû.Kaptanên keştiyê li meydanê tunebûn.Bêyî kaptan kes ne haydar bû ku dê kî li wan xwedî derbiketa an jî kî berpirsiyarê keştiyê bû.Herkesî dixwest ku fêm bike. Dem diborî.Bê li wan sar dihat.Herkesî çiqas di bin şal de şalek dî an jî derpiyên stur li xwe kiribû jî sar bû.Çiqas cî teng bû jî her rêwiyî xwe bi ê dî ve dişidand ku necemide.Humehum bi însana ketibû.Herkesî rewş şîrove dikir.Ku însan li kaşên keviyê hebûna dê wan bigota keştî keştiyek şere û şervan amadehiya şer dikin.

Aslîka di qatê şevê de li serî ber bi Tekîn ve zivîrand.Xwîn li Tekîn dikelî. Dem ber bi destê sibehê ve.Ën Afganî û ên dî ketibûn derdê dolaran jî.Hadî û kurdên bakûr ne di atîra markan de bûn;ku biziviriyana jî markên wan li ciyê xwe bûn.Ji rêwiyên jê hinek çilmisî bûn ,hinek digiriyên.Wan dolar dabûn.Hinek jê nizanibûn ku dolarên xwe dabûn kî jî.Dû ji keştiyê bilind dibû.Hawar û qîrîn bi rêwiya ket.Tekîn ji cî rabû,li ber nigên Aslîka li ser piyan Rawestiya.Dunya li rêwiyên tarî zimak.Hadî jî rabû ser piyan.Ew kes li ber çavê Hadî ket ku ji hundirê keştiyê de derdiket.Hadî şik bir ser wî ku wî agir beredaye keştiyê.Pir dem derbas nebû ku li keviyê bi sedan leşker. Çend tekneyên ku weke ewlehiya keviyê dihate binavkirin nêzî keştiyê bûn.

Tekîn mîna dergûşa li dû diya xwe li dû Aslîka bi kelogirî dilebitî.Waxtê Aslîka li tekneyê siwar bû wê jî li derdora xwe pa bê ka Tekîn jî siwar bû an na.

Keştî hate temirandin.Piştî nîvsaetekê hemî rêwî birin hewşa qereqolê. Maseyek ji dozger re amade kirin.Hercarî yek dihat hember wî. Piştî agahiyên nasnameyê werdigirtin çend pirs araste dikirin weke,'Tu diçî

ku?Kî alîkarî da te?Te çiqas pere dan?Tu eleqeya te bi rêxistinan re heye an na?"

Hadî xwe li dawî digirt.Tirs û fikar ketibû dilê wî.xwe li dawî digirt li gorî wî wê dozger jî aciz bûya wî nema tişt jê bipirsiya.Kesên kamera di dest wan de li dû dîmenên balkêş bûn.Herkesî serî berbijêr kiribû.Heya êvarî incex hesêb ji sed kesî pirsîn.Dozger guherî bû.Du roj û şevê man li wir. Kesên bakûr ji ên dî vediqetandin.Hêsir li çavên Tekîn ê ku bûbû gola xwînî xuya dikir.Aslîka ji dûr ve waxtê halê tekîn dît wê çaxê hezkirin di dil de keliya. Hêvî li herduyan jî şikestibû.

Hadî bi tevî gundiyên xwe dîsa li hotêlê bûn.Kesê şiwirmend pirs ji wan dikir.Li hêlek e jî henek û tinaz.

"Çi bû berxên min,hun neçûn?"

"We nav da,hun dan televîzyonê jî."

Hadî dixwest a di dilê şewirmend de fêma ike. --Em hatin girtin.

"Gere hun bihatana girtin!" --Ji bo çi?"

"Hun çend heb ji tirkiyê bûn?" --Nizanim.

"Televîzyonê de hate gotin,hew bîst û pênc heb tirkiyeyî bûne,ên dî gişt derxistin derî sînor."

--Tu dixwazî çi bibêjî?"

"Ma hîç bala te nekişandiye heya niha?" --Çi?"

"Çiqas keşiyên tê desteserkirin tê de bi piranî riwêwiyên dereke û biyan tê de hene."

--Min hê jî tu tişt ji gotinên te fêma nekir.

"Kurê min,hemî dolarên wan ma ji şebekeyan re,ku ew nehatiban girtin dê şebekeyan bi qasî heyşsed hezar dolar heqê keşiyê bidana."

www.amude.de

Şikên Hadî rast bûn. Wî kesî bi qestî agir beredabû keştiyê. Keşti jî ne ew keştî bû ku rêwî heya Îtalya bibira. Sohabeta bi şêwirmend re li xweşa Hadî diçû.

--Tu dibêjî em bûne masiya nîvçe ya di bahrê de?

"Hunê biçin hîç meraq nekin, weke ên çûn hun jî hunê biçin, ji we hinek wê bi Jinên Ewrûpî ên bi wijdan ku salê wan çil pêncî ne re bizewice temen li xwe pûç bike! Hinek ji we wê qasî deh panzdeh salan di karê avadaniyê d bixebite û tût û rût, nemir ne jî li wan deveran bijî. Hinek ji wê bizewice û nema êdî vegere ... Çizanim ... "

--weke ku tu jî xwedî êş bî?

"Mi çavê xwe kor kir sê lawê xwe şand. Jê yek li Elmanya bi yeka çil û pênc salî re zewiciye neam dikare xwe ji destê qehpikê xelas bike. Ên dî jî bi qaçaxî dixebitin lê hê jî tu gû bi dst wî neketiye. Ewrûpî we hertim li ser pira Siratê dihêlin, derdê di ser derdan de jî hertiştî bi navê însanetiye dikin. ma di vê rêwitiya we de qey pariya wan tune ye ... Ez jî kurd im berxê ... " Piştî van gotinan ji berkêşka maseyê du qalib sabûn dexist da wan û bi tewrên dayikek şîret li wan kir.

"Rabin biçin xwe bişon, xem nekin ezê ava germ li we nebirim."

Kêfa wan ji germahiya şêwirmend re hat. Şêwirmend tu car xwe li kesî nedikir xwdî, her roj dibû şahidê karesetan. Hadî wextê sabûn ji dest girt xema kesên hatibûn zivîrandin bi wî re parvekir.

--Xalê min, nêzî çarsed û pêncî kesî bûn ew, ev jî tê wê wateyê ku malik li çarsed û pêncî malbatî xera kirin ...

Kesê şebeke vala nesekinî bû. Bi şofêrê 'tir'ek re lihev kiribû. Ciwan hê di nav avê de bûn wî berdestê xwe şandibû. Dîsa ketin rêvê carê li benda tariyê jî nesekinî bû. Li ciyek xalî û keresî li tirê siwar bûn. Şebeke du kêrên tûj da wan ku bêhn li wan biçikiya diviya bû çadira li ser tirê

biçiranadana.Hê bi qasî du kîlomêtro neçûbûn kelemteran pêşî li tirê birîn.Dîsa qereqol,lêpîrsîn Vêcarê agahiyên nasnameyê hilnegirtin ji ber ku haydarbûn ku ew hê ji bin çav derketibûn.

Weke bêşensiya xwe dihesibandin.Beriya êrişa yanzdehê Rezberê her roj bi hezaran rêwî bi awayek serbest derbas dibûn,lê niha dewletê rê nedida.

Bi kulmisan bi dîwarê hodeyê ketibûn.Hadî hêviya xwe ji riya bi ser avê de birî.Ji Tekîn tika kir ku lêzimê wî markên wî bîne bide wî.Tekîn çû têlêfon kir. Mamoste ji tekîn re gotibû ku yekî dî heye her carî hew du kesan bi tirê dişîne.Ku Tekîn jî bixwesta dê Tekîn û Hadî bi wê riyê biçûna.Tekîn nikaribû bi pejiranda lewma markên wî li navçeyê li nik zêrevan bû.Bi Hadî xweş hat.Navê sîmsar dabû Tekîn.Tekîn jî nav û navnîşan da Hadî.

Bê hal bûn.Giş raketibûn.Saet di heştê sibehê de xeber hat ji wan re ku diviya biçûna Edenê.Gişkan xatir ji Hadî xwestin û serî dan riya Edenê.Wextê Tekîn û Hadî hevudu maç kirin Hadî bi xemgînî çend gotin jê re got.

---Navê wê Aslîka bû.Hêvîdar im ku hun rojekê li Ewrûpa hevudu bibînin.Dil li Tekîn tenik bûbû.Bêvila xwe kişand û bersiv da.

--Ev dilê rezîl ,însan nizane li ku birîn hildigire.

Hadî bi tena serê xwe di sikakên basmanê de digeriya.Dikanek ku tê de goştî mirişkan dikirin nav nan û difirotin hebû,xwe li riya dikanê girt ku xwarin bixwe.Cotek

solên sîpor ê herî erzan kirîbû.Şekal lê peritî jî.Çû pêncî markên dî hur kir. Nan xwar û heya yanzdehê şevê geriya.Li veşerê di holek bankeyek de du kes li ser kartonê weke ku li ser doşeka hevrîşîm bin raketibûn.Li wan nihêrî.Bû niçeniça wî,"Bi qasî însan bêşeref,bi qasî însan har û hov, bi qasî însan baş û binamûs dîsa însan e"got û ket riya hotêlê.

Di hodeyê de weke girokek ar bû. Bi tena serê xwe mabû. Hê hay jî dûriya xwe çêbû. Dillê bûbû dilê çivîkek birîndar. Hîskînî pêket û giriya.

Serî lê giran bûbû. Mîna dayika dergûşa wê weke meyt li ber çav be bi sergêjî di hodeyê de diçû û dihat. Hewaya hodeyê jî ew tengezar dikir. Li dû girînê çav lê ziwa bûbûn. Serî û gewde lê sist bû. servekirî kete xeweke giran.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

24

Dotira rojê çû navnîşana sîmsar. Wan ji kesên tacîr re sîmsar digotin. Sîmsar li vesaneka hatibû kifşkirin li benda wî bû. Ev kes ji sîmsarên dî çêtir bû. Wî tu kes nedixapand, çawa biryan dikir hertişt bi wî awayî bi rê ve dibir. Ew jî bi saya pismam ek

xwe ketibû vî karî. Ji hefteyê an jî mehê carê du kes dişand, serê însanê jê re hezar mark dima. Hadî û sîmsar xwe bi hev dan nasîn. Sîmsar pênc hezar mark jê dixwest. Hadî di cî de sar bû. Sîmsar sedema pereyê zêde jê re vegot.

---Piştî riya avê ket talûkeyê û ewqas kes di riyan de mirin, şofêr jî çar hezar mark dixwazin. Dimîne hezar mark, ji wê hezar markê jî ez hinek didim yekî dî, ê dî dimîne ji min re. Bo xatiran ez sêsedê dî jî ji te nagirim. Sîmsar ji navçeya wan bû. Hadî çû tîlefônê Sofî kir. Gere heya roja mayî jê re hezar û pêncsed mark bişandiba. Hadî mîna delodîna n dimeşiya.

Sofî bi tevî Zerîxan rica ji gundiyekek kiribû. Zêr bi deyn wergirtibû û ji hadî re bi rê kiribû. Hadî û sîmsar dîsa hev u du dîtîn. Lê sîmsar bê hêvî bû; gere kesên dişand hinek bişibiya şofêrên tiran. Hadî hê jî weke zarokek xuya dikir. Hadî markên Sofî jê re şandibû jî da sîmsar. Sîmsar markên li nik mamoste jî girtibû. Tarî ketibû erdê. Sîmsar Hadî bir hinda şofêr. Şofêr li Hadî nihêrî. Neket serî. Bi destê sîmsar girt û ji Hadî dûrket. "Ez ditirsim

,hîna zarok e,wê li bikevin şikê."Sîmsar hinek jî bi xemgînî û dilsarî hat nik Hadî û rewşê jê re got.

--Wele,kurê kerê ditirse te bibe. Mark dan Hadî û xatir jê xwest.

Hadî bê hêvî bû.Anor û rewşa wî nedihîşt bizîvîre gund.Ji kesên ji karesat û afata di navbera Îtalya û Arnawit te xilas bûbûn jê yek hevalê wî bû û li Stenbol bû hê.Têlêfonê wî kir. Hevalê wî di têlêfonê de navê sîmsarek ji navçeya wan bû û li Stenbol bi cî bûbû got.Li gorî hevalê wî riya herî baş niha ew rê bû.

Têlêfona sîmsar wergirtibû.Sîmsar ji gundê wan zewicî bû.Gotinên wî jî yek bi yek dişibiya gotinên sîmsarên dî.

"Tu hema siwar be were.lawê hevlingê min jî vaye li vir.Ewraqên wî amade ne.Hema siwar be.Gere sibehê em karê te yê fermî xilas bikin.Ku tu li Îzmîr saet di dehan de siwar

bî,sibehê saet di heft an jî heyştan de li vir î.Ez li pêş rêwingeha ( )li benda te me."

Rewşeke bi mij û dûman ... Her axînek bi xwe re destek goşt ji canê wî dibir.Ku rewşa bavê xwe û diya xwe ya ku wextê zêr deyn kiribûn dianî ber çavê xwe wê çaxê xwe piçûk didît û laneta kûçikan li xwe dianî. Her êşê ji xwe re fikir hêza biryarê;wê li Ewrûpa bi şev û roj bixebitiya.Beriya hertiştî deyn bida.Dû re hêviyên dê û bav bi cî bianiya.

Çû hotêlê.xatir ji şêwirmend xwast.Gotinek ku şêwirmend ne li bendê bû got. --Xwezî tu nivîskarek bûya ...

Li hemî rêwingehan gerî daku kîjan erzan bû.Raic û buha bi awayek fermî giş yek bû lê dîsa jî hinekan erzan dibir. Bilêt wergirt.Bi qasî saetekê li wan deveran çû û hat.

Di rê de çav li erdnîgariyê digerland lê tariyê ew keys nedida wî. Rêwiyan di van riyên de bê deng bûn.Keçika ku hostesî dikir ,sipasiyê xwe derdikir

ku rêwîyan şîrketa wan bijartiye. Herwiha zagonên rêwitiyê jî bi bîra rêwîyan dixist.

Piştî du saetan keçik poşetên qehweyê,ên çay belav dikir.Ji hêlek ve jî bi bîr dixist

ku "cola" jî heye.Waxtê hat nik Hadî ji Hadî jî pirsî. Hadî hinek jî bi fedî diranên xwe ên zerbûyî vedişart,bi dengê nizm "Qehwe." Got.Keçik di ser wî de xwar bûEv kesên evqas bi serbestî diaxivin yek ne hêjahî tilîka te ye,tu ji bo çi evqas bi şerm tevdigerî,ma ne heyfa te ye."axaftina keçikê mîna satila ava sar bi ser de rijiya.Bi bédengî li keçikê nihêrî ...

Gotinên keçikê bû sedem ku li şerma xwe bifikire.Di şevbuhêrkan de bi saetan li ser çongan bê deng rudiniştin.Hertim wan zimanê xwe terbiye dikir. Dibistan ji bo wan huzura yezdan bû.Ev tişt ku li hişê wî carek dî ter dibûn serî dihejand.Carê ku bi meleyê fermî re derbarê ol de ketibû gengêşiyê li ku bû di gund de ferman lê dihat rakirin ji alî kalepîran ve.Tu tiştên xerab jî negotibû,hew ji mela hêvî kiribû ku hinek jî bala însanan vebikişîne ser rastiya wan.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

25

Waxtê toza qehweyê dirijand îskana pilastîk bîranînek wî bi bîra wî hat.Hê heştsalî bû.Bavê wî ardê salê berdida kewara ard.Ew şiftazî kirbû û kiribû kewa rî. Wî ard

didewisand daku ard bi cî bibe!Piştî ji kewarê derketibû bi awêneyek piçûk li xwe mêzekiribû.Rahiştû kevîran û bi çêr û dijûnan re avêtibû diya xwe. Hemî jinên cîran bi wî kenîya bûn.Kena wan ew bêtir sor kiribû.Baskên çavan dadixist û bilind dikir daku hêri rê nedin xwe.

Li ber derê rêwîgehê sîmsar li benda wî bû. Hemî rêwî ber bi serwîsa nav bajêr ve meşîyan.Ew ma li ser piyan.Sîmsar nêzî wî bû û ,"Hadî"got. Hadî



merheba lê da. Her du jî li serwîsê siwar bûn. Sîmsar pasaport û nasnameya wî jê girt. Pasaporta xwe ji havînê de weke tevdir wergirtibû. Sîmsar ew bir mala xwe û ji bona vîzeyê Bulgar derket çû.

Êvarî vîze girt û hat. Merivên wî hebûn. Li deriyê sînor jî yek dîtibû. Serê her rêwiyê pêncsed mark dida kesê di derî de peywirdar. Wî jî şîretên xwe li Hadî û li lawê hevlingê xwe dikir.

--Li Bulgar wê jinikek bê pêşiya we, hun hîç mereq nekin. Li ser we heryekê gere sê hezar mark mabe. Bi vê gotinê dixwest qise ji wan bikişîne. Hadî pê derxist û serî li gotina wî birî.

--Min hezar mark da te li ser min ma sê hezar û du sed mark. Rastiyê jê re negot. Sîmsar, "Ne xem e." Got, çay ji wan re dagirt û dom kir.

"Divê hun her yek hezar mark jî bidin jinika li Bulgar. Piştî hun derbasî Zagrep bûn du hezarê mayî jî bidin Hemo. Hemo ji ji navçeya me ye. Ew pir baş dixebite. Hun viya bizanibin bes e, çî dibe kêfa wî ye dawiya dawî hunê derbas bin."

[www.amude.de](http://www.amude.de)

26

Çivîkek Baskîkestî

"Çiya bilind de Ez te nebînim Sorgul sor bûne

Ez neçirpînim

Ez dil di ser dilê xwe û te ra nehewînim."

Ji zargotinê

Li Zagrep bûn. Hêvî êdî li Hadî diseridî. Hemo li lawê mamê xwepirsî. Mamê Wî u sîmsarê li Stenbol hevlingê hev bûn. Hema mark ji wan xwest. Hadî derxist mark dan wî.

. Di pozê xwe de vin diaxivî. Yekî pişt lê hinek xûz bû. Nêzî çil sal bû temenê wî. Jina wî Bosnayî bû. Ji wir şûn de heya Silovenya wî kes dişandin. Li

Silovenya jî sîmsarek dî hebû kes ji wir derbasî Îtalya dikir. Hemo weke ku mizgîn bide wan diaxivî.

--Şansê we pir e,hunê hema îşev bi rê bikevin.We heryek çiqas ji bo xerclixê pere ma li ser we?

Hadî-Sed û pêncî markê min ma. Lawê mamê wî hew keniya.

Êvarî berdestê Hemo hat ew girtin û ketin rê.Ew li Hirvatîstan li malek bi cî kirin û çû.Mazûvanê mal zilamek pêncî salî û jina wî ya çil û pênc salî bû.Yeka runerm û devlîken bû.Dengek pir nerm li ser bû.Jinikê ruşelt ji bo nivînên wan amade kiribû.Hema ji kulînê xwaarinên amade kiribû li ser maseyê bi cî kir.Tewrên wê ên germ bêhn lii Hadî û hevalê wî fireh dikir. Hadî ne ji wan kesên xerîbî dikişand ji wan bû.li navçeyê jî li gelek malan bûbû mêvan.Bi çav gore nîşanê hevalê xwe jî da.Bi destan destşokê ji jinikê pirsî.Jinik weke xeletiyek kiribe bi ken,'Ya ya "got û ciyê avdestê rê wan da.Herduyan jî gore,ser û çavên xwe şuştin.Hadî goreyê şil di dest de ber bi derê pêş ve meşiya.Jinik bi tirs beziya,gore ji dest wî girt û bi destan xwest ji wan re bibêje ku gere ew tucar dernekevin derve. Herduyan jî bi şîroveyan ji jinikê fêm kirin.

Yekî xwîn şîrîn bû.Wextê xwarin dixwar jinik bi rehm û şewq et li wî dinihêrî.Bi rengê xwe jî dişibiya ewrûpiyan;waxtê li Îzmîr di mala berdestê sîmsar de şîret li rêwiyan kiribû ji rêwiyan jê yekî ji wî re,"Bila tu xema te tune be,lew re tu dişibî wan" gotibû. Wî jî di bin çavan re li jinikê dinihêrî gelo jinik bi çiyê xwe diya wî bi bîra wî tîne.

Jinik hînî hin peyvên bi kurdî jî bûbû.Piştî wan xwarin xwar,"Hewal,sipas?"!got û feraqên li ser maseyê berhev kir. Hadî jî alîkarî da wê.hadî gavên dostaniyê avêtibû.Heya piştî destên xwe şuşt jinikê bi destan serê wîmis da û pê kêfxweş bû.Hevalê wî jî weke çavnasiya wî bipesîne,"Îşê te îşe,ji niha de jinik mîna ku diya te be,bi alîkariya jinikê be

jî tuyê derbas bî."got û keniya. Hadî li her ciyê heya ji dest dihat hevok dibijartin.

--Jin li her cîyê jin e,ku mêr kanî be ew dibin Ava Mezin.Ava Mezin milek Mûradê bû.Herdu jî hinek bêdeng man.xemgînî û bê haliya wan li xweşa jinikê çû.Jinikê bi tenê ne hin peyvên bi kurdî dizanibû herwiha kesên kurd û deruniya wan jî hinek dizanibû,ew di kiliyek de mîna lehiyên biharê dicoşyan di kêliyê de jî perîşan dibûn.Deng li wan kir,"Hewal,sitiren ... "got û bi dest dxwaz kir ku bila dengêwan nizm be.Ev bû tiştê ku Hadî tucar nedikaribû bi cî bianiya, stran gotin.Hevalê wî jî bê deng ma.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

27

Jinik bi ser wan de neçû.Bi sedan kes li mala wê bûbûn mêvan.Serê her însan dirav ji sîmsar digirt.Carna hin kes bi mehan mabûn li mala wê. Mêrê wê bi roj tu car li mal nedisekinî.Ew him ji dirav dilxweş bû him jî ji însanan ku bi tenê nedima.

Dotira rojê her du li ser nivînan weke ku li gundê wan dihat gotin ,bê xem razabûn.Tav li xênî şîrîn bûbû.Z ilamê jinikê dîsa ji mal derket û çû.Roj li wan bûbû nîvro. Herdu jî şiyar bûn.

Hadî hingiya ji mal derketibû bi çavek ji dil li ber awênayê li xwe mêzenekiribû.Dest da tuncika xwe û dîsa da aliyek. Lawaz bûbû.Ber çav lê kûr bûbûn.Mil ber bi paş ve li xwe fireh kir. Hate holê.Jinikê herdu dest bilind kir û ji heryekî deh mark xwest. Herduyan jî bê xem derxist mark dan jinikê.Jinikê hê taştê da wan.Çerçawa bû wê di nav rojek an du rojan de biçûna.Lê roj dîsa li Hadî çep dizivîrî.Êvarî bi qasî çar kesên dî jî anîn wir.Saet di nehê şevê de herçar rêwiyan wê rojê bi tevî hevalê Hadî birin!Hemo ne li wir bû.berdestê wî ku rêwiyan bakûrî jê re ,eyaxçî, digotin ew dibirin.Hadî bi hêriş ji wî kesî pirsî ku ji bo çi nabe.Wî kesî xwe

li rebenî datanî û bi tirkî bersiv dayê,"Rica ederim,bana s6yleneni yapıyorum.Sanırım sorun paradır.Hemo para istiyor."(Tika dikim,tişta ji min re hate gotin ez bi cî tînim,zen dikim ku pirsgirêk dirav e,Hemo dirav dixwaze.)Hadiyê ku ewqas runerm bû niha ji wî agir dibarî.

--ite soyle, ne parasi,burda başıma bir şey gelirse hiçbirinizin sonu iyi olmaz.(Ji se re bibêje ji bo çidirav,ku li van deveran tişte bi serê min de bê dawiya we gişkan pûç e.) Hadî bi tenê mabû.Ne dengê zarokan ne jî dengê ajalan ji derdor dihat.Ziman

tunebû ku bi jinikê re biaxiviya.Ji çante pirtûk derxist.Helbestên ku êdî ji ber kiribû dîsa xwend.Pirtûkxwendin ji bona ku rumeta jinikê li hember wî zêde bibe bûbû sedemek dî.

Jinikê her ku her roj ji herkesî deh mark digirt jî xwarinên bi buha amade nedikir. Pirî caran jî taştê nedida lewre rêwiyên dixwestin wext di xewê de derbas bikin.Jinikê di wextê taştê de ew şiyar kir.Navrojê jî dîza herî bi nav ji wî re amade kir.Ji wê xwarinê êvarî neda mêrê xwe.Nedixwest mêrê wê bibîne.

Pênc roj lê derbas bûbûn .Tu kes ne dihat ne jî diçû.carna têlêfon ji jinikê re dihat lê Hadî nedizanî bê ka mêrê wê ye an sîmsar in.Êvara pêncan du kesêk dî anîn .Ew alewiyek Çorimî bû.Şeva pêşîn Hadî xwe li wî nekir xwedî.Roja dîtir hevokên ku ê Çorimî bikardianî bala wî vekişand.Her ku diçû qeşa ya ji şer di navbera wan de cî dabû xwe diheliya. Navê wî ciwamêrî Duzgun bû.Ji Hadî re diyar kir ku bapîrên wî ji Dêrsim koçî Çorim kirine.Bêhn li Hadî fireh bûbû.Duzgun pir di rê de nemabû.Wê piştî biçûya Îtalya dê zava û xwişka wî bi texsiyê bihatana pêşiya wî. Destek Hadî li ser dil diaxivî.

---Ev pênc rojin ez li vir im lê ez nizanim bê ka li pêş xênî çi heye, rengê xênî ê derve çi reng e,li derdora xênî av heye an çayir û çîmen ...

Jinikê bala xwe dabû destê Hadî ê li ser dil.Xemgîn bû.Bi şev Hadî di xewê de

naliya bû.Jinikê çûbû li wî nihêrî bû ku ew di xwêdanê de bûbû mîna av. Hinek jî bi lavatî ji mêrê xwe tika kiribû ku daku ji sîmsaran re bigota bila Hadî jî bişandana.Ji ber ku reng jî li Hadî ne rind bû bala Duzgun jî kişand.

---Ma tu nexweş î?

--Na na, hinek bêhna min çikiya.

--Ku em pevre biçin Îtalya emê te jî heya Fransa bi texsiyê bibin.

--Se, weke ez dîl girtibim bêyî ku heqê wî be dirav ji min dixwaze.

--Zulm û zordarî hew reng diguhere,niha em di dest wan de ne,sebir û aramî.

Yekî rahişt melkes ê dî jî cil û xalî tikûz dikir.Jinik dikenî. Hersê runiştin.Hadî çixat ji dest duzgun girt û bi wan lîstik da lîskandin.

Duzgun bi bejna xwe û biriyên reş û simbila stur diîşibiya Dêrsimiyân.Dengek stur li ser bû.Moral dida Hadî.

---Çiya nikarin serî bi xort û keçên we re bikişînin,çi bi te hatiye,ma tu di dest şebekeyên bênamûs de ketiyê emanê;ne ku ew ji hezkirina lê ji tirs qûna xwe be jî herkesî derbas dikin.Ma ne te got ji navçeya we ye ... Dilê xwe fireh bike.Ez soz didim te

[www.amude.de](http://www.amude.de)

28

ku emê heya dawî pevre bin.Ji hêlek ve li ber dilê Hadî dida lê reng liwî jî qimitî bû.Her du bi tevî dema kin jî neçar bûn ku bi hev beled bûna.

Hadî hewl dida ku hevokên herî nerm û şîrîn bibijêre û bikar bîne. Li hêlek ve jî hewl dida ku weke şelafî neyê dîtin.

----Di vê rêwitiyêde ez bi xwe û bi rastiya xwe hesiyam,niha hinek be jî bi rasiya te û rastiya ên dî,rastiya mazûvanên me dizanim û ez dizanim ku

em derbas bibin jî emê bikevin nava dilê dêweke heft serî,tu dizanî bi qasî ku tê zanîn çîrok,gotegot û efsane ne ewqas dûr in ... Belkî jî em hê jî bi şens in,hîç nebe li ser avê melkemot nêzî me nebû.Ku tu nehatibayî ,çi derew bikim,ezê tengezar bûma.

Bi tirkî diaxivîn. Lewre jî carinan Hadî ji bo derbirînê peyv nedidît,wê çaxê jî gotin lê giran dibû.

Panzdeh roj li wan qediya bû.Heft kes û jinikek bi zîstan anîn .Her du jî bi kêfbûn."Vê carê "digot hadî ,"Vê carê emê ji vir jî xilas bibin."

Êvarî mazûvan ket hundir bi dijwarî ken li rû belav bû.Derbasî hodeya razanê bû.Hadî û Duzgun li ber destê jinekê weke du keçên jêhatî xebitîbûn.Ew zê de jî newestiyayi bû.Ji bo Hadî û Duzgun ruşelt danî ser qenepeyan.Hode nîşanê jinka zîstan da. Hinek fêkî û mêwe ê şuştibû jî danî ber serê jinika zîstan .Xêniyê wan duqat bû.Weke havîngehek bû.Jinika zîstan û ji mêran yek berdewamî pevra diaxivîn.Kebaniya malê ji bo zilamê ku tiyê jinika zîstan bû jî ruşeltek danî ser qenepeya sêyemîn da ku ew jî li hinda Hadî û duzgun razê.Ji bo ên mayî jî li hodeya qatê duyemîn cî amade kir.

Waxtê kebanî çû hodeya xwe ya razanê zilamê wê li ser nivînan kûr û dûr difikirî.Jinik jî ket nav nivînan.Herduyan jî lawek xwe di şer de wenda kiribûn.Li hember kesên li wan dibûn mêvan weke ku peywirek jî bi cî bînin tevdigeriyan.Her roj jî dîmenên şer ên kirêt bi wan rêwiyan re carek dî dijiyan.Zilam êdî aciz bûbû ji vî karî.Ji hêlek ve jî diravên distand biryar bi wî paşve dixist daku dev ji vî karî berede.Kebanî serî danî ser sînga wî. Dixwest ji avê nermtir be;biryar dabû ku ji bona Hadî tika ji zilamê xwe bike daku ji wî re bibe alîkar.Zilamê wê hîn jî weke kevirek hişkesar ,bê bertekî difikirî. Kebanî rabû,wêneyê lawê xwe anî.Li ser nivînan runişt û dest bi girî kir.Zilam serî ji ser balîf rakir ,wêne ji dest wê girt û ew hembêz kir.Ji hêlek ve jî lêborîn ji wê dixwest.

---Gere ez êdî biryarek werbigirim,xizanî ji vê êşê çêtir e,tu ji sibehê heya êvarê li ser piyan î ...

Kebanî bi coş,"Na na, ez ne ji kar bi gazin im,ji te tika dikim ku tu ji Hadî re bibî alîkar. Nîyeta Hemo tune ye wî derbas bike.Te ew roj bidîta dest datanibû ser dil.Ez weke jinek li hember wê dîmenê mam di şermê de.

--Tu dizanî ,heya ew dirav nestînin dijwar e. Hinek bi xof û şik,

--Em,gelo em nikarin hinek alîkarî bidin wî,got û mêrê xwe ji dil û can hembêz

kir.

Zilam cardin serî danî ser balîf ,"Baş e" got.

Dotira rojê berêvarî Hemo û berdestê xwe jî hatin. Mazûvan bi taybetî bi Hemo û berdestê wî re diaxivî.

---Jina min ji min û ji we tika dike daku hun kesê bi navê Hadî bişînin,bawer dikim ku nexweş e jî.Hemo hinek fikirî ,bi pozê sola xwe hinek dî erd vekola û bi hêrs destpêkir.

--Ev bela giş min dibînin,de ka em hinek zorê bidin ser ku dirav li ser tune be emê bişînin.

Bi tevî markên Sofî ji wî re şandibû giş pênchezar û pênsed mark gihiştibû Hadî. Çar hezar mark li riya wî çûbû.Şesede mark xwaribû.Sêsed mark jî di wê malê de xerc kiribû.Li ser wî mabû şesed mark.Wî hew dused mark di bêrîka xwe de hişt,çarsedê dî jî veşartibû.Hemo bang li wî kir.Waxtê Hadî derket Duzgun jî da dû.Duzgun, beriya ku hemo destpêbike axivî.Wî ji deruniya kesênwanî bêtir fêhm fikir,ew bi salan li Stenbol mabû û bi her tiştî re mijûl bûbû.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

29

--Hun bi jîna me dileyîzin ... Hemo gotin ji dev wî girt.

--Ji alî te ve tu pirsgirêk tune ye,emê îşev we derbixin lê wê hadî li vir bimîne,pereyên wî kê m in,gere hê hezar mark bide me!

Hadî weke ku ji asîmanan de bikeve.

---Hezar markê çi,li stenbolê me li ser çar hezar mark peyman çêkir,ez xapînokê

we me.

Hemo hê jî bi rik bû.

---Ez bi Stenbol nizanim,gere tu pere bidî me ...

dev û lêv li Hadî reşûşîn bûbû,xwe ranedigirt.Duzgun hê jî zor dida derî bê ka belkî vebike lê Hemo deriyek asê bû.

--Binihêre Hemît Beg,ku Hadî bi me re neyê,ez jî ji vir nig navêjim tu deverî.Ku em nikaribin bi we emê xwe bi we bidin kuştin,ku ew jî nebû emê her riyî biceribîn.

Hemo rê da hevokên bi hestiyar.

---Ji xwedê bitirsin,herkes di nav zar û zêçê xwe de,em li ser van riyan hertim girtin û kuştinê didin berçavê xwe ji bona çend quruş pere.Ma Hadî însanê min e,ez jî

naxwazim li vir bimîne. Baş e,wê çaxê bila Hadî soz bide min ku çu Fransa bila hezar markî bide birayên min.

Hesabê Hemo ew hesab bû ku çi bi dest bixistiba ji karê bû. Hadî bi van lîstikan dizanibû lê dîsa jî hinek dest di berxwe de bereda.Ku vê carê jî neçûba wê çi wext birêketia ne kifş bû.Ku difikirî wê dîsa bi tena serê xwe bimîne xof ew radipêça.êBaş e,baş e"got û li hember gotina "Hezar mark" derket.

--Soza min soz e lê ez incex pêncsed mark li wir didim birayê te,ew jî piştî ez bixebitim.

Niçeniça Duzgun bû.xwe ranegirt.



--Ne ew însanê te ye,ji bêrîkê de pêncî dolar derxist ber bi devê wî dirêj kir û domand.Ev e ev însanê we,ne şerm e,tu niha muameleya dîl an bi Hadî dikî.

Hemo melisî bû.

---Bi sê teleqan ne weke hun dizanin wanî ye,binihêre pênc lêzimên min derbas bûn,gere pênc hezar mark bidana ,tobebe ku pênc quruş dan min,ne ez tenê me. Hun jî dizanin ev garanek bê serî ye.

Hadî,"Garan çer garan "got û ji wan dûrket.Duzgun jî da dû wî. Duzgun weke ku bişerefa wî hatibe lîstin bi madeyek tirş gazin li Hadî dikir.

---Ji bo çi Hadî,mesele bi tenê ne pere ye, wî doza xeracê li te kir. Hadî dîsa dest da ser dil û deriyê dil li wî vekir.

---Mêraniya însan bi tenê ne di dest însan de ye,ev bû çiqas dem nizanim lê ez baş dizanim ku diya min hertim li ber derî runiştî ye û li benda dengê ye.Ku ji kerba ew bimire ezê xwe weke kujerê wê bihesibînim.Bila haya te jê hebe ku ez bi însanên wanî baş dizanim.Li welatê me em îsanna bi çar navan bi nav dikin yek,Kawa,yek Mem,yek Zîn ê dî jî remza hemî kiritiya Beko ... Em bi cîsnê Beko dizanin,ku fersend ket dest wan pêxember dev ji pêxembertiya xwe berdidin û direvin ...

Waxtê çûyînê hatibû.Kebanî bangî Duzgun û Hadî kir.Ew birin kulînê. Heryekî du poşetên naylonî da wan ku di ser goreyan de bixin piyên xwe.Heryekî poşetek jî da wan ku bixin çantê xwe.Di poşetan de kartolên xaşandî bi tevî hêkên xaşandî hebûn.Ji dolabê de qatek pîjame derxist da Hadî ku lixwe bike. Hadî nexwest bigire.Jinik bi dengê bilind,"Hewalll" got.Hadî rahişt pîjameyan.Jinik derket. Hadî pîjame li xwe kirin. Pîjame ên lawê jinikê bûn.Waxtê ji dolabê derxistibû hinek xof ew girtibû lê Hadî jî êdî wek lawê xwe dizanibû.Cara yekem bû ku ji ber çûyîna komêkê şad nedibû. Hadî xwar bûbû ku destê wê maç bike.Jinikaa zîstan bi dengê nizm bang li Hadî kir.

---Birayê min ,te rehma jinan dîtiye ne,çiqas kafir be jî însan e.  
Hadî li jinika zîstan nihêrî,bê bersiv nehişt.Hemo nîşanê jinikê da û axivî.  
---Xwişka min kafirê mezin wa ye di ser te re sekini ye,kafir ne ev jinike.  
www.amude.de

30

Hemo bi hîrîn dikeniya Û diaxivî.

---Na na ferqa min û wan nemaye,ma jina min jî ji van deveran e.  
Biryar hatibû wergirtin gere Hadî,Duzgun û du kesek dî li texsiya yekemîn  
siwar bûna.Hadî beriya ku li texsiyê siwar be pîrsa lawê mamê wî jê kir.  
--Lawê mamê te ghişt Fransa?  
--Na.

--Ew jî ji te ne dûr e,ji bo ku wê çaxê min bişîne tu hewl nîşan neda.

---Wayê li Îtalya di kampê de.Yaho,herkes dixwaze xwe xilas bike.

--Nizanim te tu car anî ber çavê xwe ku rojekê ez û tu, li welat an jî li ciyek  
dî, li ser  
,maseyê pêrgî hev bîn ...

---Na na wele na,ezê rojek li ciyek geber bibim wê tew kes mirina min jî  
nebihîse ...

Li Silovenya bûn. Hadî pêşî tîlefon da diya xwe dû re jî bi jinika Hirwatî  
ve axivî.Ji jinika Hirwatî re hew,"Hadî .... Silowenya ... "gotibû.

Berêvarî sîmsarê li Silovanya ew giş berhevkiribûn.Ew sîmsar jî kurdek  
Amedî bû.Duzgun hê bi ser Hadî diket,"Hadî .... Silowenya .... Ê Hadî niha  
jî ,Hadî .... Îtalya .... ,Hadî .... Fransa ..... ,Hadî ... "

Sîmsar li wir dolmîşek kirîbû.Berdest da pêş wan û ew birin nik dolmîş.Li  
dolmîş siwar bûn.Jinika zîstan tengezar dibû.Ji serê wê re çend roj  
mabûn.Li gundekê berdestê sîmsar hember rê wan da û ,"Haaa ew dever  
Îtalya ye,êdî hun bi tena serê xwe diçin" got.

Hadî û Duzgun hêriş birin ser berdest.

----Heya ku tu me ji sînor derbas nekî tu bi ciyek de naçî ...

Tirs bi ser berdest ketibû. Wan jî dizanibû carna di nav rêwiyan de kesên berxwidêr, an jî bi bela û serhişk hebûn. Ji şofêr re, "De tu dolmîş ji vir dûr bixe, ez hinek dî jî wan bibim hê bizîvirim." got. rêwiyan dî bi mihnet li Hadî û duzgun dinihêrîn. Çavê herkesî li ser jinika zîsta bû. Bi qasî pêncsed mêtroyî çûn kelemter bi texsiyên sipî li wan derketin.

Hadî û Duzgun ber bi sînor ve beziyan. Ên dî man li wir. Kelemter jî zêde ne bi rik bûn ku îlahîm wan bi dest bixin.

Bi helkehelk di nav daristanê de dimeşiyar. Gihiştibûn Îtalya. Serûçavên wan serde çûbû. Duzgun poşman bû ku jinika zîstan bi tevî ên dî li wir hiştibûn. Hadî weke tasek av bi se xemên wî de birijîne.

--Mereq neke, Silovenya jî weke Îtalya ye, wê do rojan bihêlin di dû re sê roj dem bidin wan daku ew Silovanya terk bikin.

[www.amude.de](http://www.amude.de)

31

\*\*

## TILÛRÊ BÊGANE

Redwanê Alî

TILURE BEGANE

Redwanê Alî

Diyariji hevalên xortanî û zaroktiya min, Bavê Nazê û Bavê Goran re.

TILURE BEGANE

ÇÎROK

Redwanê Alî

WEŞANÊN WELAT

Stockholm 1991

Weşan: 4

Çapa Yekem

© RedwanêAlî

Pergela berg û rûpelan: N. Kirîv

Wêneyê berga pêşin: Dilower Mêqerî

Çap: Nya Wiking Tryckeri AB, 1991

ISBN: 91-971254-6-6

NAVEROK

TilûrêBêgane

9

MuhraMuxtêr

76

Civîn

81

Resûl

89

Seyro

98

Xij-xijoneko

106

Pêşgotin

Macir û

macirtî di çand û

edebiyata gelê kurd

de û

nemaze di ya devkî de, şexsiyet û mijareke taybetî ye ku bi

sedsalan hatiye bikaranîn. Di sitran, destan û çîrokên gelêrî de, meriv viya gelekî vekirî dibîne. Macirî, ji sedsalan û vir de ye ku di jiyana xelkê kurd de xwediyê beşekî xas e.

Xêrnexwazên gelê kurd, ji bo ku wan bipişêfm û wenda bikin, çî rê û metod hatine hişê wan, wan ew bi kar hanîne. Ku

dîrok

rastiyê

U

xwe

deyne,

ev

gotinên

min

ê

jî

çewt

dernekevin. Ji ber vê yekê ez ê çêlî hemû rê û metodên xêrnexwazên gelê kurd nekim.

Na.

Lê ez ê tenê li ser metodekê bisekinim.

Dûndstin: Ji hemêza dê û yarê, ji germiya malbatê, ji danûsitandina gund û eşîrê, ji kultura welêt... dûndstin. Ev di rojên berê de jî û îro jî her bi kar tê. Ev polîtîkayek e û li her deverê dunyayê jî bi kar tê. Lewra li gor wan dewletên xwediyê vê polîtîkayê, ev metoda ha metodeke maqûltirîn e û nemaze li hemberî rewşenbîran bi kar tînin. Rewşenbîrên ku bi ber vê xezeba dewletên xwe dikevin, ji war û welatê xwe dûr bê pî û bask di xwe de dişewutin û ji bêgavî tiştina dikin. Karûbarên polîtîkî, edebî.

kulturî dîkin û li ber xwe didin. Pirî caran jiyana dîndstmê li ser hunermendan bandoreke gelege hêja vehewandiye û ev bandor jî re bûye sedem ku berhemên hêja bide aîrandin.

Lê ku em vegezin ser kurd û jiyana dîndstinê, em ê têbigêhîjin ku jiyana dîrxistina me û xelkê jî ne wek hev e.

Du cudayiyên girîng hene: Yek, wek entelektuelekî, wek karmendekî an jî tenê wek hunermendekî, kurd ji welatê xwe ne hatine dîndstin. Pirî caran ew tev zarûzêçên xwe, wek malbat, wek eşîr ji warên xwe bûne. Ya duyemîn jî, ji bilî çend berhemên kevn û bi dizî, kurd ne xwediyê lîteratureke niviskî ne. Wan nivisandina zimanê kurdî li derveyê welatê xwe, li jiyana sirgûnê (exil) ava kirine. Ku em li ser jora Kurdistanê bipeyivin, ev gotinên min ê baştir cîyê xwe bigire. Lîteratura kurmancî îro li derveyê welêt di dema xwe ya geştirîn de ye û şax dide. Herçiqas di vê demê de meriv pîvanên berhemên hêja di lîteratura kurmancî de nebîne jî, ew berhemên ku heta nuha derketine, bi me didine zanîn ku hêviyek heye. "Tilûrê Bêgane" vê mîzê dide meriv. Wek stil, form û hûnandina xwe mîzgîriyekê dide meriv ku ew ê bi kurmancî berhemên hêja derkevin.

Redwanê Alî bi hunermendiya pênuşa xwe, bi awayekî realîst jiyana maciriya me kesên ji welêt dîr, di formeke noveleke modern de bi lêv kiriye. Ji ber vê yekê jî, niviskar hêjayiyê hemîgiramî û berhema wî jî hêjayiyê hemî pesindayinê ye. Ku di pêşerojê de dewleteke kurd ava bibe, instîtut û akademyên kurdî dîroka gelê kurd binivisînin, ew ê beşekî xweser jî li ser maciriya kurd binivisînin: Di vî beşê de ew ê cîyekî taybetî bidin "Tilûrê Bêgane" ku tê de zehmetî, qiriktalî

û dijiwariyên jiyana maciriyê di şexsiyeta «Mircan» de bi ruh  
û can bûye û hatiye zimên.

M.AÎK.

'Dijyanê de meriv tenê tiştê ku jê tê dike,  
yên mayîji xwestokên xwe bi xwe re dibe gomê. "

Îvan Turgenyev

TILÛRÊ BÊGANE

I-

Li ber duriyaneke ji duriyanên jiyânê westiyayî, baskşikestî, rawestiya ku hilma xwe bîne ber xwe. Çiqasî bi endîşa xwe dûr nerî û bilind rêsa, ewqasî jî asoyê jiyana serfiraz dûrtir ket û bilindtir bû... Pêwîst bû ku li ciyê xwe nemîne. Pêwîst bû ku bide ser rêyekê ku çerxa demê di ser re derbas nebe. Lê jiyân! Ev hilovka ku bi milyonê salan di dil û hişê merov de meyaye, qet tu kesî hemû rewîştên dahatûyên wê bi nav ne kirine. Mircan, ne bi dil ne bi can rêya bêganetiye, ya ku li ser wê, asoyê xwe di rewrewkek şikestî de didît, hikebijarti bû.

Ew, weke qirş û qafê mlrî, pûç û bêgiyan, li ber bayê xezeba bahoza çavsoyî hilweşiya bû û li zemîneke bêgane termê wî hişk bû bû.

Zuwabûna wî ne weke zuwabûna giliçeke dara mirî bû û çihnisandina vn ne weke çibnisandina şitleke biçûk ku tu wê ji erdekê biguhêa erdekî din. Reh û tamarên wî 32 salî bûn, zû bi zû rewa erda bêgane û xerib ne diçû ser wan. Ew weke dareke bejî ku di rezekî bêxwedî û bêcenan de mezin bû be; her ku darê, bi zagonên xuristî rehê xwe berdida, dig^ û berî xwe digirt, bahozekê ew ji qurm ve dihejand û li ber xwe dibir. Lê weke her ruhberekî jiyânê jî, jîndariyê ew şîn dikir û berxwedana tamaran bi kotekî dom dikir. Warê nû, jiyaneke nû... û zagonên civakek nû. Ji nû ve lertz û jen di zelûltiya çavan de meyand. Ê weke ku di her civakan de, sînorê

danûstendinê, hevaltî û hogjrtiyê, mervatîyê, piç bi piç zelal û ki^ dibe, di vê civakê de jî, li ber çavên wî hişk hatin kişandin û eşkere bûn. Mêvantîyê jî sînorê xwe derbas kir.

Dawîya dema rawestanê hat û demeke hişk weke risasê giran û sar dest pê kir: <Ji 10 heta 15 rojan tu ê li hotêla penaberan biqedînî, belaş bixwî, vexw... Dûre tu ê biçî bajarekî, şeş mehan ziman hîn bibî... Dûre tu ê bibî wek her endamekî vê civakê! Êdî tu û zanebûna xwe, tu çawa dijî, bijî. Dayîra Fransa ciyê biyaniyan rewş weha pê dan naskirinê.

\*\*\*

Sibeha damn bû li Parîsê. Mircan, weke her sibehên van deh rojên dawîn, vê sibehê jî xew rabû li ser dengê xirecira zarokên diwaserê xwe yên ku bi wan re li ser qatekî dijiyan. Lê vê sibehê, bi xilafî van her deh rojan, gava ji xew rabû, me-reziya zarokan qet qehr pê re çênekir. Pêşiyê bi qasî bîsteke dirêj fikirî, dûre bi dengê nizm di ber xwe de got: «Zagonên jiyanê çi ecêb û seyr in! Heger ne dengê van zarokan bûya, belkî ez ji xew ranebûyama û negêhama ser wexta çû>ina bajarêxwe?!»

Gava Mircan ev gotin got, di ber xwe de bi xwe kenîya û gotinê xwe yên ku her sibeh van çaxan digot, gava ji gurmînî û qajewaja zarokan şiyar dibû, anîn bîra xwe. Weke ku xwe sûc-dar bibîne ponijî: «Min ewqasî qehra van zarok û dê û bavê wan hildihanî, va ye îro bi kêrî min hatin... Ma kî dizane ku çi ji jiyanê re divê û çi navê?»

Sibeha dawîn bû li Parîsê... Ê sibehên rêwiyan kin in, lê tijî  
10

end^ û xeyalên sivik in. Sawa ku dilê Mircan dilerzand, sa-



weke taybetî bû. Vê sibehê, çawa biliviya, çi bikira li kelemên van çend rîjên dawîn rast dihat, yê ku weke sitiriyên di laşê wî re diçûn. Tiştê biçûk û mezin, girîng û ne girîng, hêja û ne hêja hemû tev radibûn û ew taromaro dikirin. Ji nişkê ve dengê operloyê di hotêlê de kire zimînî. Ramanên bi sitirî birî û ricifeke sivik xiste nava wî: «Kesên ku wê herin Babilonê, ji kerema xwe re seet li nehan, bê dereng<sup>^</sup> dakevin eywana qatê yekemîn!» Bi zimanê inglîza û fransî operloyê kire zimînî. Gava dengê operloyê rawestiya, Mircan çeng bû û çik li rasta odê sekinî û bi dengê bihîstî ji xwe re got: «Lo hema ez ê ji van zarokan xelas bim, hema çi dibe bila bibe. Li Babilonê ez ê devê xwe li gemê bixim, ez nema xwe bi yek mirovî didim naskirin!» Bi lez xwe tev kir û bêyî ku taştê jî bixwe, daket eywana qatê yekemîn.

Eywan vala bû. Tu kes hîna ne hati bû. Mircan li seeta xwe nerî, dît ku ji wexta çûyîne re hîna nîv seet maye. «Wa... Ez navqetiyayî bûm, law!» Di dilê xwe de got û hêdSca bi şermzarî li ciyekî, di qozîya eywanê de rûnişt. Mirês û tevgera wî bû bû mîna yekî beziyayî û qutifiyê ku xwe ji xelkê vedize. Wî serê xwe ranedikir, ne dixwest çav li kesî bikeve ji van yê ku di van deh rojan de nas kirine. Ne dixwest silavê li wan bike, ne jî xatir ji wan bixwaze. Di qozîyeke eywanê de bêdeng merisî. Lê di hinavên wî de hewasê bi sitirî, lertz û jena bêgane aloz vedan.

\*\*\*

Wexta ku roja pêşîn, dostekî Mircan ew <sup>^</sup>and vê hotêlê, di ciyê cîjin de xatir jê xwest, bi şûn de vegeriya û çû, Mircan xwe wekî dergevanekî xam di nav pêlên deriyekî bê ser û bin

de dît... Wê çaxê jîjinikek zerhimî, hestîû çerm, çavpan, dir-  
vê

vîetnamiyan pê diket, li ber derî kaxezên wî ji dest girtin,  
derbasî odekî bûn, mifteyek û sê bilêtên keskê biçûk anî, da  
dest wî û bi îngilîziyeke şikestî ew serwext kir:

- Oda te li ser qatê hefta ye. Jimara wê 13 ye, -destê xwe  
ber bi derîyekî ve kir- Ji wir jî pêwîst e ku tu bi asansurê hilki-  
şî... yekî welatîyê te, berî te di odê de ye. Ew ê sistema jiyana  
11

vir bi te bide naskirin.

Mircan giya negiya van gotinan bibihîze, dît ku jinika hestî  
û çerm piştî xwe dayê û weke robot bi meşeke hesinî jê dûr-  
ket.

Mircan piçekî li ciyê xwe rawestiya û li ser gotina jinikê  
«welatîyê te» fikirî, lê fam ne kir ku mebesta wê çi bû. "Gelo  
wê ji xwendina kaxezên min fam kir ku ez kurd im? Aya me-  
besta wê ya ji «welatîyê min» ev bû ku ew jî yekî wekî min  
kurd e, yan yekî ji welatê ku ez jê tîm, e?" Çimkî bûyerên bi  
W ren^ gelek caran pê re derbas bû bûn, lê bêyî ku bigêhîje  
tu encaman, ji ciyê xwe liviya.

Li bendî asansurê gelekî ne ma. Lê gava deriyê wê vebû,  
qîjewîja şeş heft zarokên gemarî, pêxwas, potretîlî li pêşiya vw  
bilind bû. Gava dît zarok di hundirê asansurê de xwe didin  
hev ku ciyê wî di nav xwe de çêkin, Mircan jî tîgêhîşt ku ew  
dernakevin û berê wan ne li tu deran e. Ê wexta dît ku her  
yekî ji wan bi awakî dixwaze destê xwe bigêhîne bişkoka qatê  
heftan, fam kir wekî ew ê bibe diwaserê wan. Zarok bi zima-

nekî dipeyvîn, Mircan tiştêk ji wan fam ne dikir, wek ku tirkî, farisî û erebî tev li hev bikin!

Li ser qat, ireaşî zarokan tev dengê mûsîqake erebî pir bilind bû. Te ê bigota tu li bazareke rohilat î. Di nav wê ireaşî û dengê bilind de, Mircan U oda xwe geriya. Gava gêhîşt ber deriyekî ku hejmara 13an li ser e, têgêhişt ku bêfêde ye li derî bixê: Dengê musîqê bi sitranên erebî ji wir dihat. Piçekî derî dehf da, dûre sê caran lê da û gava dengê «Eywa» bilind bihîst, derbasî hundir bû...

Xortekî li dor 30 salî, çavzer, bi bejnûbal, tena «şeyalê» bin cilan ji ser qaryola xwe rabû, dengê teypê piçekî nizim kir û destekî pan û zivir, bi xêrhatinî dirêjî Mircan kir û bi erebiyeke sade got:

- Ehlen we sehlen, inşeleh hema birayê me ereb e?!

- Ez erebî zanim! -Mircan bişirî û bi angoya gotina xwe ya taybetî serê xwe piçekî hejand.

Xortê çavzer, weke ku ji gotina Mircan ya ewil, li tîna bi-xêrhatina xwe poşmam bibe. Bi mebesta tenegehiştinê, mat-12

mayi pu-si:

- Ma tu ne ji Iraqê ye?

Mircan ji texmîna diwaserê xwe fam kir ku wî li ser rewşa kesên «bi erebî zanin» lê bi jêza xwe ne ereb in, tiştina zane. Lê yekser xwest xwe ji rewşa «bersivdar» derxe û wî têxe bin darê pirsên xwe:

- Ez kurd im!... Navê min Mircan e!.. Yê te bi xêr?

Yê çavzer piçekî serê xwe yê bi mijûl xiste ber xwe û bê^

ku li çavê Mircîm binêre got:

- Ehlen we sehlen ya en. Em birayê hev in! Navê min Şadî ye. Tiştê girîng ew e ku tu erebî dizanî!

Dilê Mircan piçekî şeetî, gava piştî hildana navê netewa xwe ji diwaserê xwe bihîst ku «ya girîng ew e ku tu erebî dizanî» û pêre pêre gotina jinika robotî «welatîyê te» di serî de xulxulî. Lê dawîya vê şeetandina dilê xwe, bi xwe re gêh^ wê baweriyê ku zû bi zû û rastiyên jiyana xwe pê nede naskirin.

Çarîkek derbas bû ne bû, Mircan û Şadî, weke ku teqla hevdu texmîn dikirin û li xêzên pêşî yên karakterên hevdu rast dihatin. Her yek ji wan teqnekê rawestiya, mîna ku li ser wan pirs û gotinên hindikî ku ji hev bihîstin, difikirin. Ji nişkê ve, qîjewîja zarokan li ser qat bilind bû û gurmegurma wan nêzîkî derî hat. Şadî bi bihîstina dengê wan, weke rimekê çeng bû, destê xwe yê zivir û pan bi kulmikî heta jê hat li masa pêşîya xwe xist û bi lez dengê teypê heta dawîyê bilind kir û weke ku bi int rabû, wiha jî bi şida xwe avêt ser text û bi dengê bilind mîna di sûkên rohilatê de ban dikin, bang kir:

- Yaho, ma ev jî jiyana e? Kerekî turk xistine oda kêleka me, heft heyşt zarokên wî hene. Ne bi şev û ne bi roj, tebatî nakeve wan, dengê wan ji guhê me demakeve... Dîreqisin, distirên, digrîn, hildiperikin dîwaran... Qat hilweşandin ev

yên ha!

Di wê rojê de Mircan gelek tişt li ser sistema jiyana, penaberên hotêlê ji Şadî nas kir. Du sê caran bi wan bilêtên keskî biçûk, ew û wî, bi hev re çûn çeştixanê, nan xwarin... Mircan bala xwe didayê ku Şadî qet behsa ûştê penaberîya xwe nake

û dema ku gotin nêzîkîyê U vî babetê dike, ew bi awayekî eş-  
13

kere xwe ji ber dide alî û naxwaze bipeyive. Pêşiyê bi xwe re ket gumanan û texmîn kir ku «hema wî baweriya xwe bi temamî bi min naniye». Lê ne tevgera Şadî û ne jî gotinên vn rê ne dida ku wêneyekî serast di hişê xwe de li ser rewşa wî û ûştin penaberîya wî çêke. Şadî, ji xeynî babeta «Qîjewîia zarokan» û bê edebtiya dê û bavê wan, li ser tu tiştî dirêj qise ne dikir. Rojekê, Mircan di rêza çeştxanê de bû, Şadî hat cem sekinî û bi melaqî bişirî:

- Rêz dirêj e, ez naxwazim têkevim dawîya wê, ew ehmeqên bêhiş li dawîya wê ne. Ez naxwazim çav li wan kevîm!

Mircan bi nermî pirsî:

- Ma tiştêk di navbera te û wan de çêbûye?

- Na, lê ez zanim ku gelekî bêcir in. Ev zêdejî mehekc wan li vir qediyaye. Wan di<sup>^</sup>nin kuderê, qayO nabin... Berî ku tu werî vir, bi heftayekê keti bûn greva bir<sup>^</sup>ûnê, ji ber ku dayirê ew dişandin bajarekî jê re dibêjin Babilon. Lê wan qebûl ne kirin û ne çûn... Hevalê wan li vir, li Parûê pir in, wan hîn dikin ku bi tu deran ve neçin, ji bo ku wan li Parîsê bihêlin. Şadî bi dengê nizm gotina xwe dirêj kir, lê Mircan piştî bihîstina navê Babilonê bi wan reweştan, nema bala xwe da gotina wî. Ew di rewşa xwe ya dahatû de, li vî bajarê ku kes pê qayîl nabe, fikirî. Lewra wî di van du sê rojên pêşîn de, ji berpirsiyarên hotêlê nas kiri bû ku wî dişînin vî bajarî. Piştî bîstekê,  
bi

ser  
-wan  
yên  
ku  
Şadî  
qal  
dikir-  
de  
zivirî  
û  
bi

zivirandina xwe re, çavê wî û du xortan li hev ketin. Mircan di jiyana xwe de, bi sedan dêmên bi wan reweştên çiya^ dîti bfl. Ji her gundekî Kurdistanê merov dikari bû qeflek xortên bi xisletên wan bi hev de: Dêmên bi ser gewrayê ve, bêvilên beranî û çavên hingivîn bi nerînên matmayî û xemsar...

Mircan du sê caran bi nerînên hûr û awirên nasiyê li wan xortan nerî û bêyî ku şeetandina dilê xwe bi kiudatiya wan diyar bike pirsî:

- Ma ev yê ha, merivên wan zarokên qatê me ne?

- Na! Lê gişt weke hev in! bersiva xwe kurt da û mîna ku di vî babetî de jî nema meraqa wî ya qisekirinê hebe.

Li çestxanê, ew herdu xort hatin ser maseyeke nê^kî Mir-

14

can û Şadî rûniştin. Serî bêhnekê, çavê Mircan û yekî ji wan li hev diket. Carekê ji wan yekî serê xwe ber bi Mircan ve kir:

- Tu bi kurmancî dizanî?

Mircan bişirî, lê berî ku lê vegerîne, dengê Şadî ji kêleka xwe bi dengê nizim bihîst:

- Dest pê kirin! Çêtir e ku tu li wan nenêrî û bi wan re ne-peyivî!

Mircan awirên matmayî di Şadî dan û bêyî ku mana ^eta wî fam bike, di dilê xwe de got: "Ev ê serpan, pozê xwe dixê işê min û nigê xwe zêde)î xwe radide!" lê bi beşerek xweş li xwediyê pirsê vegerand:

- Erê, ez kiu-manc im! Hûn xelkê kuderê ne?

Yê kêleka wî, ku hîn ne peyivî bû, bi dengê bilindtir got:

- Em xelkê Kurdistanê ne! Madem te gotinê me bi kur-mancî bihîst, ma hewce ye ku em hûia ji te re bêjin, em ji kuderê ne!

Ev dengê bilind bi Mircan hinekî naxwoş hat, dengê ku xort di nav diranê xwe yê şikestî re «s» dikir weke «th» ya inglizî, nexasim li vî ciyê giştî. Lê di dilê xwe de got: «Kur-mancê me ne, gundî ne, weke xwe derin!», nerîna xwe li ser wan kêr kir û xwarina xwe xwar.

- Bira! Ev bênamûttê bi te re ne kurd e, ha! Haya te jê he-be! -deng ji hêla wan herdu xortan, dîsa bilind hat.

Mircan bê>î ku serê xwe rake, dengê diranşikestî ji lefza tîpa «s» nas kir. Lê weke ku tu wî di nav ava sar de bikî, mûyê laşê m rabûn û nema dizanî bû ku ew ê çî lê vegerîne. Piştî bîstekê ji rawestanê, piyê xwe piçekî hejand û li hêla wan nerî, lê bê^ ku çavê xwe têxe çavê wan. Xwarin nema di ber de diçû û guhê wî man miç.

- Mecîd! -xortê din, bi ser yê diranşikestî de rabû- tu tim bi

vê bflmtengiya xwe şaşiya dikî!

- Hevalê Felît, ne şaşî ye! Xortekî kurd e, bila hifza xwe ji vî bênamûttî bike! Ew, wî natt nake!

Mircan di gotinên van xortên bi navê «Mecîd» û «Felît» de mijûl dibû û U kêleka xwe, di bin çavan re, li tevgera Şadî dinêrî. Piştî bîstekê, Şadî sênîyên xwe nîvco danîn ser mesefê  
15

û weke mar, bêdeng şeniitî û hêdîka derket.

Mecîd û Felît hatin ser masa Mircan, xwe bi hev dan nasirinê û dûre wan Mircan bi xwe re birin oda xwe û çîroka Şadî jê re, ta bi derzîyê ve kirin. Mecîd digot: «Em li îtalyayê bûn, kar bi dest me ne diket. Me rêberek dît. Bi eslê xwe tirk bû, serê yekî, me 300 dolar dayê ku ew me bê vîze derbasî Fransayê bike. Berî wada hatina me, bi du rojan, yê rêber hat û ev bênamûs anî cem me. Got: «Ew jî kurdekî weke we ye, asîmfle bûye û bi kurdî nizane, ew ê bi were dakeve Fransayê!... Ne wî bi kurdî dizanî bû, ne jî me bi erebî zanî bû, me ji hev fam ne dikir. Du rojan li cem me xwar, vexwar... û gava em hatin vir, me poxê wî dît!...»

Gava Mecîd dipeyvî, Felît jî gotinên wî rast dikir, yan jî mana wan diyar dikir. Gava gêhişt «me poxê wî...», weke bêje «ji vir û weha, nema ji pispora min e» û got: bera îcar hevalê Felît ji te re li ser fen û fûtê wîbêje.

Gava Felît dest bi peyvê kir, Mecîd rêzek taybetî jê re girt û rûçikê xwe kir weke guhdarê çeleng. Gotina wî jî tu carî ne birî. Felît bi giranî dest pê kir: «Em kurdên Kurdistana rojava, şoreşgeriyê çavê me vekiriye... Insan, çiqasî biçûk, bêhêz û



bêhêvî bin jî, em şoreşgeran ji wan çêdikin... me zanî bû ku Şadî ne şoreşgcr e... em pê ne xapiyan, lê me got, kurdekî we-ke bi milyonan kurdên asîmîlekirî, em ê berê wî bidin rêya xebata milletê wî... Li Parîsê, hevalemî li dernekê bi erebî zanî bû, ew kişf kir... lê me got hema ne casûs be, ker be jî em ê wî bînin ser rê... Ereb be jî ne xem e! Tirk jî û erebê baş jî ji bona azadiya Kurdistanê, xwîna xwe dane!.. Gava em bi hev re ketin greva birçîbûnê -ji ber ku em hemû avêtin giudekî biçûk, me ne xwest em herine wir- ew jî bi me re rûnişt. Lê nefsdênî bû, bi dizî diçû xwarin dixwar û li dor keçikan digeriya... Ku ne ji me bûya, ew niha ji zû de avêti bûn kampekî ku kûçik jî lê najîn.. Ew kûçikê kulûjayê!...»

Mircan wê rojê heta deren^ şevê bi Felît û Mecîd re ma. Gava hat oda xwe, dît ku Şadî weke hebaneke mişt, zengiriye... Serê wî di ber de ye û dûmana cixarên v/î, hundir dagirtiyê... Bêdeng cilê xwe danî û ket nav ciyê xwe, lê ji wê rojê

16

de, te ê bigota Pierre û Peterê Erinbûrp(\*), bi hev re peyman danîne, û şerê xwe ji bîstekê dispêrin bîstekê. Mecîd û Felît, ji roja ku Mircan nas kirin pê ve bû bûn diridirik... Her cara ku reşê wî bidîtana, li hotêlê, li derve, li çest-xanê...  
xar  
dikirinê,  
didan  
tengalê  
û

^et

lê

dikirin...

«Intelektuelê kurd gerek weha be... û gerek ne wusa be!...»  
Nema dikarî bû çarîkekê jî bi tena serê xwe bima. Û piştî her derketinek yan jî axaftineke bi wan re, Mircan di çavên rûniştvanên hotêlê de hîn bêtir dihat naskirinê. Kesê ku fortê Mecîd û Feht bihîstin, nas kirin ku: dostê wan, Mircan, «doktor e», «kurdolog e» û deh salan li Bulgaristanêxwendiyê!... heta yên ku bi kiu-dî û tirkî nizanî bûn jî ev herdu gotin li ser Mircan fam kiri bûn...

Mircan di van deh rojan de bû bû weke çûkê şUbûyê ku hêlîna wî U ber lehiyê çû be... Hundir ne dihat tehmûlkirin û U derve şîretan guh jê biri bû. Di odê de, ji bilî roja dawîn ew jî piştî çûyîna Şadî, wî rojekê jî nikari bû, ne serê xwe rakira, ne jî dengê xwe bibihîsta.

\*\*\*

Mircan di rûniştina xwe de qerimî, lê xirecira zarokan û dengê wan; hilma dijminatîyê, şîretan, hesretên deh salên xerîbiyê, bêriya welat, dê û bav, heval û hogirên zaroktiyê... ew ker û gêj kiri bûn.

Di bin çavan re dinêrî û didît ku di eywanê de, hin bi hin (\*) Du lehengên çîroka Qelûna Le^r e. Ev çîrok, çîroka Ilya Ehrenburg e (1891-1967). Di vê çîrokê de Pîrreyî fransî û Peter'ê almanî di şerekî ji şerê Cihana Yekem de rastî hev tî. Lê ew ^r nakin. Qelûna titûnê dibe sedema rawestina serê navbera wan. Lê weke du dijminan baweriya wan bi hev nayê. Heryek dixwaze 'beriya mirinaxwe' hilmekêji qelûnê bêkê^ne. Berê ti-

vingên xweji ser eniya hevdu nadin alî. Pi^ku hilmên dirêj ji qelûnê dikê^nin, wê qelûnê dîsa bi tirs davêjin ber hev. Pi^ku dûmana qelûnê dibilejî, bi mana ku bi hev re ser nekin, ew her qelûna sarji hevdu re davêjin.

17

hevalê «oxira» vê sibehê pir dibin. Ji peyv, tevger û dêmê wan xuya dibûn ku dudu tirk in û dudu jî polonî ne; jin û mêrekî vîetnamî û yekî afrîqî ye.

Ji nişka ve dengê jinika «robotî» di eywanê de hat, bi îngilîzîyeke şikestî: «bidin dû min!» got û berê wan da otobuseke ku U derve, U hêviya wan rawestiya bû.

Gava otobusa wan ji ciyê xwe leqiya, Mircan di rûniştina xwe de bû bû weke kevirê ku tu bavêjîbinê bîrê!... rêyeke nenas; erdekî nenas, berê wî bi ciyekî nenas ve û bi hevalên oxirê nenas re... tu U ku û BabUon U ku!

'II-

Di xortaniya xwe de, Mircan weke lokê hêc bû, ne barê giran, ne rêya dûr û dirêj çavê wî dişikand û ne jî serê wî dixiste ber wî. Nerîna wî hertim U asoyê jiyana serfu-az bû...

Hîna neh deh salî bû, kevkanî, qewsik, tîr û kevan bi destê xwe çêdikir û zarokê di çaxa xwe re hînî şer dikir. Ji wan re digot: «Divê em xwe hînî şer bilin, û gava em mezin bibin, em ê herin alîkariya Berzanî bikin!» U di nav hevalên xwe de, di gel ku ne yê herî bi gewde û qelafet bû, lê hertim eyan bfl, rêber bû. Carina, gava ku dengê diya xwe ji nav dengê pîrekên taxê bi pesn û fortê xwe dibihîst, erdê ew tehmûl ne dikir; dayikê digot: «Mircanê min, weke teyrê baz e, qelafet biçûk

e, lê rêbazekî jîr e!»

Ew di her tiştên xwe de, ji zarokên taxê ki<sup>^</sup> bû. Ji ber ku di maleke niştimanperwer de rabûbû, çîrokên U ser şerê Berzanî, ji giştan bêtir dizanî bû; ji giştan bêtir sitran û sirûdên netewî zanî bû, û ji giştan bêtir dizanî bû awaye zilamê mezin û xwedî peyv bike. Di malê de, Mircan, mezinê xûşk û birayên xwe bû, yê herî delaU bû... Piştî ku diya wî ew anî, demek dirêj nexweş ket û ji zarokan qut bû. Gava Mircan şeş heft salî bû, hertim diya xwe di nav Uvînên nexweşiyê de didît. Û carina gava ji lîstikên xwe dihat, dilê dê rehet ne dibû ku ne bi destê xwe xwarinê dayne ber û wî têxe bin baskê xwe. Dê di ber re davêt û digot; «Teyrikê min î baz, ez bi qurbana çavên

18

te yê reş bim, xwe wUo gelekî qure neke, tu ê çavîna bibî lawê min!»

Dengê Mircan ji piçûkanî de xweş bû. Wî gelek caran tenbûrên teneke, bi destê xwe çêdikir û tev zarokan distira. Hertim jî, gava mêvanên wan dihatin, jê dixwestin ku ji wan re sitrana «Şev Çû» yan jî «Welatê Me Kurdistan e» bêje. Lê heta ku Mircan navlêhUd<sup>^</sup>mek ji diya xwe nebihîsta, sitranên xwe ne digot. Carina jî pê naxoş dihat gava ji hin mêvanan gotinên weke: «lawê Inê ye, heta dê nebêje, ew nastirê!» dibîhîst.

Mircan 12 salî bû gava diya v/î ezîzê ber dilê xwe veşart!

Xalê Mircan, ji birayên diya wî, yê piçûk, di şerê 1967an de (şerê îsrafl û Ereban) hat kuştin. Mircan ji hemû tevgera xalê xwe, ji bilî ku U tenbûrê dixist, tiştek ne dihat bîra wî. Gava ku

Umê mirina wî jî hat, ji gotinên miezîyan, xirecira çûn û hatinê... tişteke fam ne dikir. Tenê rondikê dê, çavên wê yên her-tim şil û gotinê wê yên şîrê ku U ser birayê xwe digot, dUê wî dêşand û ew xemgîn dikir. Ew gotinên ha, weke ku tu bi şê-ke sor U ser hişê Mircan dax bidî, tu carî ji bîra wî ne diçûn.

Dê wê çaxê digot:

- Xwedêyo!... Xwedêyo!... Xwedêyo!...

Bi van çavan çav qeyas kir;

û ji nav kûştîyên Filistîna şewitî,

Qiloçê egîtê mala bavê xwe,

Ji boqê sinbêla nas kir!

Heyfa min rebena Xwedê nayê,

Li sinbêlê li axa xerîb veşartî,

Heyfa min tê, li zengeloka dengê şêrîn,

Bi sitranên Berzanî,

Ji mala bavê min biliyaye...!

Gava Mircan mezin bû, riya xwe bi awakî xuristî nas kir.

Wek çawa tu kes teyr û tUûra hînê fu-andinê nakin; masîya hî-nê sobayî û ayjenîyê nakin... Wiha vw jî, ciyê xwe di nav refên welatperwerên dema xwe de girt. Lê, hêcbûna ramanan, çirû-ska hiş; jîrbûn û tîna agirê niştimaniyê hertim U kendalên mi-çiqî rast dihatin.

19

Wan salên ku Mircan têdigih<sup>ê</sup> xortaniya wî U hev werdi-geriya û zanabûna wî dimeya, qada xebata welatperweriyê U hemû perçên Kurdistanê bû bû çamroxêke bêbinî. Dengê hiş û dilsoziyê di bin nîrê dijminan de, bêhêvî bû bû. Partiyên po-

lîtfîc roj bi roj pir dibûn; zelaUya bîr û baweriyên jî pê re kêmbûn. U ni^ nû, weke masiyên çemê miçiqî, di nav ^rikê de can didan. Meydan bû bû meydana fenekan û keysperestên jênîksipî. Kurd bi xwe biUya bûn. Tenê berxwedaneke piçûk U Kiu-distana bakur, bi kotekî berdewam dikir. Mircan û çend heval û hogirên xwe, çiqasî xwe di ber de radikşandin û hewl didan ku tev wê bibin, lê ji biU giU û gazinan di futona girikê de U ser wan qehremanan, ne dibihîstin.

Bi wî awayî, dîwarên ji pola, roj bi roj U dora lokê hêc dihatin danîn û gava ku jiyan jî nû nebe, merov U şopa xwe ya kevin rast tê. Di wê demê de Mucan, ji nû ve U raman, nerîn û karê ku di zaroktiya xwe de dikir, vegeriya. Bi «lîstika şer» bUiya û ji xwe re got: «Ez teyrê baz im, per û baskê min hene û min xwe di nav garana gêjan de xîya kiriye!»

Bi wê dilsoziya zaroktiya xwe, çend hevalên wek xwe li dora xwe kom kir û rêberiya wan kir. Ew û hevalên xwe bi şevan ranedizan, bi çolan diketin, xwe bi çek dikirin... Lê, ew ê şerê kê bikira û yê kê nekira. Dijmin pir bûn, hêsc, merîfet û zanebûn kêmbûn. Pê re ne gêhîştin ku serê xwe rakin, dengê xwe belav bikin, navê «eşqiya» bi dû wan ket. Ê dûre ji hev belav bûn; weke noka ku tu U kevir bixî yek ji wan U ser hev ne man. Hinek ji tirsên reviyên Europayê; hinek U mala xwe rûniştin, hinek vegeriyan partiyên xwe yê kevin...

Mircan wê çaxê di hertiştî de mijûl bû: ku xwe bikûje, hin hevalên xwe yê qels bikûje... Binketina pusa netewî, binketina dogeşa wî ya şexsî di laşê wî de bû bûn weke birînên vekirî.

Diya wî pê

hisiya bû.

Li ber derî rûdinişt,

digiriya û

dikewgirand: «Lawê min, tu hîna zarok î, tu bi fu-ê ne ketiyî, ecelê U ruhê xwe neke! Teyr bi baskê xwe, teba bi lepê xwe û însan bi hiş û aqilê xwe, xwe digêhînin miradê xwe. Kurmanc nanê garis in, lawê min... hevdu nagirin. Tu ê di heps û zindanan de birizî! Kes weke xalê te bi ser Berzanî û Kiu-distanê

20

de ne arîya, dawiyê jî berata wî bêserî ji erdê xerîb bi ser me de hat!»

Gava Mircan bi tena xwe dima, U xwe dixist û weke lokê ku tu kêrê bidî hustuyê wî, fikir orîn û diperpitî. Ji bilî tenbûrê û sitranên cengê, tişteki din ew aş ne fikir. Wê çaxê jî, te digot qey nû hînî lêxistina tenbûrê dibe. Bi şev û bi roj ji destê w ne diket.

Mircan wê demê ji mal demediket, ne dixwest çav U nasê xwe keve, yan jî bi kesî re bipeyive. Xwarin kêr dixwar û kêr radiza. Roj bi roj U xwe dişkênd. Diya wî jî, gava bi tenê dima, derî û pencerên oda wî digirt, perde bi ser wan dadikir û diçû, weke nobedaran, U ber derpiyê hewşê U ser cadê rûdinişt. Destê xwe dida ber ruyê xwe, mitale fikir û U ser rewşa kurê xwe diponijî.

Ilmê «Eşqiya» roj bi roj weke xumxumekê, di nav gel de bela dibû. Lê tu kesî tişteki çepsandî U ser endam û karên şebekê nizanî bû. Tatûleqa ku Mircan ketibûyê, roj bi roj giran dibû. Lê... jiyane deriyê fereca xwe ji nişka ve, ji dUpakiya wî

re vekir. Hevalekî wî yê kevîn, «jêniksipî», ji ev yên ku weke qazî-mazî, hemû reng di wan de hene, bi ser xumxumê keti bû. Hat ku ya xwe bi ser ya wî xîne. Bi fort û payebûn jê re got: "Kaxizên xwe yên dibistanê hazir bUce û tercume bUce, em ê te bişînin Bulgaristanê, xwendinê!» Wê gavê Mircan di cUlê xwe de got: «Tu weke gurê ku bi şivan re dixwe û bi pêz re diçêre!», lê jê pê ve çare U ber wî tune bû. Wiha jî bû. Deh salên jîyaneke dirêj U Bulgaristanê qedand... Lê ew salana ne tenê xwendin û serketinên wî bûn... Xwe^ û talî, qehr û hezkirin, polîtîk û axaftinên xwendevaniyê, bûyerên rengoreng, bêriya welat, hesreta dîtina dê û bav, xuşk û bira, heval û hogirên zaroktiyê... Bi kurtî: Deh buhar û pajîz, deh havîn û zivdistan, bi gulvedan û çUmisandinên xwe ve, bi ketin û serketinên xwe ve... şopa xwe xweş (U raman, bîr û baweriyên wî de hiştin. Lê xerîbî û bêganiyê, asoyê dûr, asoyê jîyana serfîraz, asoyê azadiya sor, çarflcekî jî, ji ber çavê wî ne xistin. Rojên ku Mircan xeberên teze U ser şerê pêşmergekî kîjan perçên Kurdistanê bibUîsta, tebatî ne diketê û ranediza. Bi 21

şevan xewn cUdît ku tev wan cUbe! Ê carina weke lokê hêc kef bi ser devê wî diket û bi orîna xwe ya bilind şiyar dibû. Pîrî caran cU xewnên xwe de (UHriya. Dibû teyrekî xerib; baskhe-sin, destpola; keldûmana devê wî cUbû agjr... Çek, sîlahên nedîtî û nebihîstî diketin nav lepên wî. Carina jî, ku rê lê teng dibû cU nav newalan re dikişîya û ber bi çiyayê ve (Uçû. Lê ku (U şer de dişikîya û diket bin, wê çaxê dikir qêrîn. Pêşmerge lê cUhatin hev û ji nû ve hazirîya xwe dikirin û êr^n xwe ber-



dewam cUkirin!...

Di salên damn de, gava Mircan xwendina xwe ya bilind (Ukir, rasthatina her gotareke nû U ser dîroka Kurdistanê, jê re (Ubû weke dohne ku tu bi ser a^ de bUcî. Bi wan hêc cUbû û hêcbûna wî giu- dibû. Carma ev rewş heftekê (Udomand û jê ne diçû. Wan çaxan rûçikê wî (Ubû wek rûçikê şêt û dînan. Heger bi roj karekî wî U derekê hebûya, zû (Uqedand ku zû vegere mal û têkeve mijûl û xewnên xwe. Di wan deman de hevalên wî, ew fam ne dikirin. Gava ku carina bi wan re (Upeyivî, gotinên xwe yên «agirî» bi kar dihanî, û ew (Ubûn ûştê xeydekê, di nabêna wî û wan de. Ji dostên wî hinekan digotin: «har e»; hinekan; «dîn e û şêt e»; û hinekan jî: «xeşîm e, ji konevaniyê fam nake!». Lê gava hêcbûna wî ji ser (Uçû, dengê hişê xwe dibihîst û ji xwe dipirsî: «Ma ew wek min xewna nabînin? Miheqeq ew di jiyana xweş de, bi jin û zarokan ve mijûl (Ubin!»

Di salên xwendinê de tevgerên kurdî, U sê perçên, KurcUstanê, bi şeweyên rengoreng şerê çekdarî dikirin. Ê «teyrê xerîb» bi wê «şêtbûna» xwe, tev U şerê hemû pêşmergan (Ubû. Geh U Kurdistana Rojhilat, geh U Kiu-distana başûr û geh jî U ya Rojavayî Berjor. Ji perçekî difuiya perçekî din. Ji cem hêzekî diçû cem hêzeke din. Ew U hev cUhanîn. Navbera wan xweş dikir. U heger bi ya wî ne kiri bûyana, dikire qêrîn û hawar, bi ser wan de radibû! Wî (U xewnên xwe de jiyaneke sipêhî didît, lê di jiyane de, perçebûn û şerê birakûjî! Gava hinek ji van hêvî û xewnên xwe dajot tev axaftina xwe ya polîtflicî, bi hin hevalên xwe re, cU çavên wan de matmayîn dixwend û ken û qerfên wan, bi lojflca xwe, (Ubflîst: «Ma ev

sîyaset e!?» Lê teyrê xerîb, her weke xwe dûr (Unerî û bilind dirêsa!

Mircan (U jiyana xwe de gelek caran dU g^t û U xerîbiyê jî gelek caran keçik guhertin, lê evînekê tenê ciyê xwe (U (Ulê wî de girti bû, ya ku pê şa dibû ew bû, ya ku pê hêc (Ubû ew bû û ya ku pê difu-iyê ew bû -ew tenê jî, dihat hemberî hezkirina w ji diya wî re. Ê ji keçflcên ku diguhart, tenê hevaleke wî, Lûsa, ya ku pê re dixwend, hinek ji hêcbûna v/î fam kir û dûre pê re dom kir. Bi wê re jî, pêşiyê hogirtiya xwencUna bi hev re ew nêzîkê hev kirin, dûre hezkirina Lûsayê ji sitran û tembûra Mircan re peywencUyên wan şidancUn.

Mircan jî, qet jin û mal û zarok ne U ser bala wî bûn. Lê mêyetî û dilsoziya Lûsayê ew xist bin darê xwe. Du salên pêşîn ji dostaniya wan, rojekê şer bû û yekê aşitî. Li hev ne (Ukirin. Lê rojekê te ê bigota ji nişka ve «hêcbûnê» bi Lûsayê jî gut. Mircan wê rojê, wêneyek (tê de, rêzek pêşmergên hêsîr, çavgirêdayî, nîvşîpiya, nîvketî, U ber gulê (Ujmin bûn- (Uhatin îdamkirin) danî bû ber xwe, bi hêrs û hêcbûn U tembûra xwe dixist. Gava ku tembûra xwe danî, Lûsayê hêsrên xwe paqij kir û bi kelogirî li ber dilê vn da:

- Hûn ê bi ser kevdn! Muheqeq hûn ê aza(Uya xwe bistînin!  
Min çirûska agirê rastiye di çavên te de dît- got û hinarûkên xwe yên şil bi dilovanî danî ser milê Mircan.

Ji wê rojê de, Mircan jê hez kir û nema dUê wê hişt...

Sala dawîn Mircan U Bulgaristanê bû bû weke miriyê ku serê wî U tirbê keve. Firandina «Teyrê xerîb» ya bê vîze, dawî

hat û hemû rastiyên jiyana tevgera kurdî, hişk U ber wî kom bûn: Ew ê here cem kê û nere cem kê!? Ew ê kê U hev bîne û kê U hev neyne!?!... Rêyek tenê U ber wî vekirî ma. Rêya ku xwe tê de bi agirê nava xwe bisoje, ya ku tê de hesretên xwe bikewgirîne, rcya xerîbiyê, ya bêganiyê, ya wendabûnê. Wî jî weke sedan ronakbîrên kurd, berê xwe da Europayê û U Fransayê cîwar bû.

\*\*\*

Otobus (U rêyeke nenas de, (U nav erdekî nenas re (Uçû û birek bêganeyên nenas, berê wan U ciyekî nenas bûn...

23

Ji nişka ve otobus U ciyekî xaU rawestiya. Yê afrîqî û herduyên tirk derketin destavê. Mircan hinekî xwe (U bin mijûlên xwe de xurcUand û U dora xwe nerî... Gelo kî (Uzane bê her yek ji van xeUcên nenas bi çi dercU ne? Dibe ku derdên hinekên ji wan, ji yên wî girantir bin. Kî dizane?

Gava herduyên tirk ji nû ve siwar bûn, yekî ji wan awirên çavnasiyê (U Mircan da, wek yekî ku bêje: «Çarenûsa me yek e!» Ê piştî ku U cihê xwe rûnişt, du sê carên din U paş xwe nerî û bi Mircan re bişirî. Mircan jî bi mana «erê» serê xwe carekî hêjand. Piştî bîsteke kin xwe(Uyê awiran ji ciyê xwe rabû û hat (U ser serê Mircan re rawestiya. Dûre hevalê wî jî hat cem. Yê ewU bişirî û pirsî:

- Kurd Iraq? -destê xwe ber bi Mu-can ve kir.

Mircan bê^ ku tu gumanan bibe ser van herdu «hevalên oxirê» sonda xwe anî bîra xwe. «Ez ê devê xwe U gemê xim!» Dûre, weke ku U sonda xwe poşman bû be, (U dilê xwe de:

«Ma xeUc hemû Mecîd û Felîl in?» got û bi xwe(Uyê pirsê re bişirî û bi kurdî lê vegerand:

- Erê! Kurd im!

Herduya pêşiyê piyê xwe hejandin, dûre xwediyê pu-sê, bi tirkî çend pirs ji hevalê xwe kir û "hummm"eke dirêj ji bêvUa xwe dendst.

Yê kin U dor 34-35 saU bû, çavekî xwe hinekî dadigirt.

Rengê wî ji nêzflc ve, weke rengê pirteqalek ku derderî bû be û efnekê avêti be ser û bêvUa wî jî tûj weke ya şojî bû. Tenê pantelonê wî yê ûtîkirî û çakête dirêj î m(xiem, ew dihanî fe-salê. Hevalê vw, jê dirêjtir bû, gewrekî sipîçolkî û kal bû. Ji dengê wî yê zîxanokî hemû şexsîyeta wî dihat kirinê. Yekî ji ev yên ku meriv çî ji wan re bêje, ew ê tim bUcenin û bi mat-mayî serê xwe bihejînin. Lê ku dengê xwe ne kiri bûya, qela-fetê wî û eniya wî ya beş, heybeteke taybetî didayê.

Yê kin:

- îsim yaho, îsim nedir? -bi dengê bUind, weke ku tu bi kerrekî re bipeyivî, pirsî.

Mircan bi tirkî nizani bû. Lê di jiyana xwe de weke gelek kurdan, wîjî axaftina tirkî, sitranên tu-kîbUîsti bû. Û gotinên

24

erebî yên ku bi tof cU zimanê tirkî de tên bikaranîn, tim dihişt ku hinekî ji axaftinên vî zimanî fam bike.

Loma bi dengê nizm û bi kiu-dî:

- Navê min Mircan e! got û dûre pirsî: Yê te?

- ArtîxU! -yê kin destê xwe bi qewet U sînga xwe xist; dûre dîsa bi wê şêweyî destê xwe U sînga hevalê xwe yê dirêj xist û

got: Emîn! Kurd Zaza!

ArtîxU hUmek kûr kişand û U Emîn nerî:

- Ax yaho... Fransa şerefsîz! ÇfleU hayat!...

Emîn serê xwe hejand, dûre destê xwe da pîyê Mircan:

Fransa baş nîya, non tê de çino! Ti fam kero?

Di vê rêya dirêj û nenas de, du rêwiyên nenas pê re bişirîn  
û bûn weke sebreke biçûk. Lê ne şabûna nasiyê, ne jî bişiran-  
dina rêwiyên liva wî, di bin mijûlên wî de sivik kirin.

-III-

Hêvî rewşa jiyânê ye. Heger hêviya meriv şikest, çirûska  
çavan, geşbûna dU û hinavan diçilmise; şûna awazên jiyânê,  
şêrînbûna dêmê wê, zelaliya gulvedana wê, rengê reş datîne û  
her tiştên wê di mirêkek şikestî de tîn dltin.

Gava Mircan bi koma hevalên biyanî re gêh<sup>in</sup> BabUonê,  
bû bû weke çûkê şilbûyê ku baskê xwe bi dû xwe de bikişîne.  
Kewên deh salên bêganiyê, gêjbûna deh rojên hotêla biyaniy-  
an U Parîsê, ew ji hawhaw de xisti bûn. Laşê wî sist û giran ki-  
ri bû û pojnê wî pir. Te ê bigota ji biU navê wî tişteki din pê re  
ne hati bû BabUonê. Ramanên wî, hişê wî, bi mijûlên ku U şû-  
na xwe lişti bûn, girêda<sup>^</sup> ma bûn. Her tiştên jiyana nû, jiyana  
nenas, rengê wan mijûl û ramanan distendin û her babetek  
teze, dihat dîtin weke rewrewka (U çavê çimandî û şikestî de.  
Her tişt U ber çavê wî bû bû wek qedereke oU û çarenûseke  
nivisandî ku meriv baweriya xwe pê hanî be û serê xwe bi ko-  
ranî, yan ji bêçaretîyê jê re danî be.

Katê roja yekê U BabUonê U pêşiya avahiyeke çarqat ra-  
westîyan, keçeke porfflikî, ne kin û ne dirêj, esmer, dêm-  
piçûk, weke dêmç marmarokê, derket pêşiya wan, geh bi

În^lî^ geh bi fransî, xwe bi wan da naskirinê: «Ez sekretera madam Laplasê me, ew îro ne hazir e. Navê min Fatîma ye! Nemînin behetî: ez fransî me, lê bi jêza xwe Cezaîrî me!... Hûn ê dudu dudu têkevm odekê. Serê her yekî ji we, ez ê îro 300 frankî bidimê. Bi wan, hûn ê ji xwe re îro xwarin û hûrmûran bikin. Heta du rojan betlane ye, ders nîne!...»

Biyaniyên nû, gişt bûn dudu dudu, tenê Mircan û yê afrîqî bi tena xwe bûn. Ew jî herdu bi hev re, (U (xiekê de bi cî bûn. Grûpa nû bi temamî U ser qatê yekê bi cî bûn.

Gava Mircan bi yê afrîqî re derbasî (xla xwe bû, her yek ji

wan bîstekc U ser textê xwe bêdeng veket. Lê te digot qey her yek ji wan, (ii vê bêdengiyê de, (U rewşa yê din de mijûl (Ube. Ji nişka ve dengê tevUheviyekê ji (xia (Uwaserê wan hat. Mircan nas kir ku ArtîxU û Emîn m. Yê afrîqî, U Mircan nerî, bi hêrs rabû ser xwe û di hundirê (xlê de çû û hat û (U ber xwe de çend gotin bi zimanê xwe got. Piştî bîstekê dfeU Mircan zivirî û bi nefsbUincU bi În^lîzî pirsî:

- Do you speak engUsh?

Mircan di zarava pirsU diwaserê xwe de, hinek payebûna xeşîm û pozbiUndiyeke ne di ciyê xwe de, dîl. Lê bêyî ku he-wasê xwe di dêmê xwe de gewde bUce, bi aramî nerîna xwe xist çavê wî û got:

- Yes, I do!

Mircan bi wê xurcilandin û nerîna xwe, xwe kir weke yekî ku bixwaze bi awirên xwe bêje: «Ev yên ku dengê wan U pişt

dîwêr tèn, ez ne ji wan im!» Û te ê bigota bi wê nerînê, kopîyeke ji nefsiya xwe şanî diwaserê xwe kir û jê re da xuyakirui ku şêweyê xeberdana di navbera wan de, cUvê bi renegekî dinbe.

Yê afrîqî, weke ku piçekî aramiya Mircan têgêhişti be, lê nexwaze zû bi zû ji ser ya xwe jî dakeve. Bi miqeresî ber bi wî hat:

- Ka hela em hevdu nas bikin!? got û weke ku cara yekem hevdu bibînin, destê silavê dirêjî Mucan kir.

Mircan mizicî û bêjî ku awirê xwe ji yên vn derxe, got:

- Helbet, pêwîst e... Navê min Mircan e!...

26

- Yê min Wawflco ye! Ez ji Ganayê me!

Mircan hinekî bi bihîstina navê «Waw3co» bişirî, kenîya, lê xem<sup>^</sup>niya dUê wî rengê xwe U ser dêmê vn veda bû. Rabûn û rûniştina wî,

nerîna vvî,

bişirandina

wî...

bi

rihetî dihatin

xwen(Un û famkirin.

Vê yekê jî hişt ku bişirandina wî ya bi

ken, ya ku piştî bihîstina navê Wawflco, bi dilgermî û dUovanî bête famkirin û herweha pira baweriyê di navbera wan de bête danîn. Piştî bîstekê, mîna ku Wawîko tika bike, pirsî:

- Mirza Mircan!... Ma tu naxwa<sup>^</sup> em bi hev re herin û ji

xwe re xwarin û hûr-mûran bikin?

Bi Wawîko re çû dUcanan, Mucan weke ku nû ji xew rabû-be û nû tê derxîne ku aniha U bajarekî nû ye û rûpeleke nû cU jiyana wî de vedibe... Cara yekê bi hişê şiyar U rewşa (Uwaserê xwe nerî: Mirovekî dirêj, weke çar tiUyan bi ser Mircan diket; bêvila pan û pelixî, lêvên cewdUc û daUqî, cU dêmekî weke giroveriya hêkê de. Li ser buruha çavê çepê, qeUşeke dirêj, wek derba kêrê ku tu U bacaneke reş bin, dihat xuyakirin. Tenê eniya beş û çavên zexelî, dihişt ku meriv cU dêmê vn de hêviya jîrbûneke merovatiyê jê bike. Gava ku Mircan U reweştên Wawîko dinerî, bi xwe re mijûl dibû «Gelo çima ev dehbayê ha aciz bû, gava dengê Artîxil û Emîn ji paş dîwêr bihîst?» Dema ku ji dikanan vegeyriyan, te ê bigota perda teklîfetê ji navbera wan hilat, lê sawa resmîyetê zêdetir bû, nexasim gava ku Wawfco li profesiyona Mircan pusî. Wê gavê Mircan, mîna ku zarava Wawko, ya pirsê yekemîn bîne ser zimanê xwe, lê bi zanebûn xwe di ser re bigu-e, got: «Ez (U warê fflolojiyê de doktor im.»

Piştî vê pirsê û bersîvê, Wawfco, rêzeke taybetî ji Mircan re digirt û gava pê re dipeyivî, hertim bi gotina «Mirza» navê wî hUdida û beriya ku tiştê bipu-siya, digot: «Li min negU-e, ez ê pîrsekê ji te bikim!»

Warê nû û nenas bû û biyaniyên teze weke gêrikan ling ne dixistin bin xwe. Geh U cada tek ya çarşiyê, geh U dora foyê, geh U korîdor û serşokê, U hevdu rast (Uhatin û weke ker û lalan bi tiliyan, bi hev re dipeyivîn. Lê yê ku weke hev û di rewşekê de bin, zû ji hev fam dikin. Ji mirêşê wan û «peyvên

27



tiUyên» wan, dihat naskirin ku hemû jî ji bajêr ne razî ne. Digotin: "Pir piçûk e û xelkê wê U biyaniyan nanerin."

Ji Mircan re, te ê bigota ev rewş ne gelekî girîng bû. Wî xwe matmayî ne dikir. Lewra beriya ku were bajêr, U ser gotinên Şadî, Mecîd û FeUt, wêneyek cU hişê xwe de çêkiri bû. Û gava bi cUwaserê xwe re çû dikanan, rewşxurustî dît û (U dUê xwe de, wê çaxê, tenê xwestinek xwest «Hema tenê, kesên ku ez bi wan re bijîm, însan bin!»

Di wê rojê de Mircan du sê caran U korîdorê û serşokê pêrgî ArtîxU (Ubû û her U hev rast dihatin, bê>î ku tu manê bide beşera xwe, ArtîxU dimizicî. Serê xwe piçekî (Uçimand û bi kur(U sUav dikir: «Roj baş!", "Beyanî baş!». Û hercar bi vê rewşê, te ê bigota nû hevdu dibînin. Bê sUav (U ser re derbas ne dibû.

Mircan bi bihîstina van gotinên kurdî, U ser zimanê xortekî tirk, matmayî ne dima. Wî ji xwe re (Ugot: «Yan hevalê wî, Emînê zaza ew fêrî van gotinên xwe yên tekane kiriye; yan jî danûstandina wî bi kurdan re ji wUo firehtir e.» Wî, jê ne dipirsî bê ew çawa fêrî van gotinan bûye. Herçiqas difikirî ku hinekî cUIê wî bi van gotinên wî yên kurdî xweş bike jî, sonda xwe ya hotêla Parîsê dUianî bîra xwe û dUê wî sar (Ubû. Xwe bi xwe: «Hîna U pêşiya me gelek wext heye, em ê bigêhin hevdu baş nas bikin.» digot û xwe racUgirt.

Li warê nû Mircan, weke ku hewl bide û rûçikê jiyana xwe rawestîne. Hêdî hêdî hawirdora xwe nas dikir. Zemînqatê foyê, îdare, oda alflcariya sosyaU, eywana televfeyonê û (Ûbistana ziman bûn; qatê yekê: Biyaniyên nû, yên bi hev re hati

bûn, U ser diman; qatê diduyan, ji Cezajîr, Tûnis û Mexribê karkerên biyanî hati bûn û tê de diman; û yekheba Fransî jî carina U ber çavê wî diketin û texmîn dikir ku ew derin qatê sisiyan...

Du sê caran çend karkerên welatên ereban (U(UI, lê tu me-reqa wî çênedi bû ku xwe bi wan bide naskirin. Ji alîkî ve mirês û tevgera wan; û ji alîkî ve jî gumana ku ew ê wî fam nekin ku merivekî ji welatekî ereb, U Fransayê fîtica xwesti be. Lew-ra temamê karkerên van welatan, bi rewşeke din bûn.

28

Ji rojên betlanê roja (Uduyan, U derve dunya ne germ, ne jî ar bû. Sirûştaya payîza aram bi meriv re (Ubişirt.. Tavek bi tîn û erdekî bi bêhna ^ya û pincarê. Bayê hênîk, hilma aviya erdê U ber tîrêjên roya devliken didêra û U bêvUa meriv (Uxist, rewa jiyanê diast nava meriv. Ê ku rewa di navê de peyda bû, hêvî, weke kavkuvflkên piştî baranê serê xwe hU(Udin. Danê sibê, Mircan, geh U hundirê (xiê geh U korîdorê û geh U dora foyê diçû û dihat. Gera U ser lingan pê xweş (Ubû û dUê m bi awazê sirûştê re lêdixist. Hê(U h&dS çûkê şUbûyî weke ku wê-

neyê xwe (U avê de bibîne, xwe da(Uweşand. Bi tena xwe diket bajêr.

Mircan cU çûyîna xwe de, tenê pêrg^ çar pênc însanan bû.

Bi xwe re ket mijûlan: «Bi Xwedê heger bajar ne kavUekî bajaran bûya, bi kêmanî ez ê pêrg^ gelek merivan bihatama.

Erê... Mecîd û Felît li ser heqiyê bûn..! Lê yê min, ji min re çi divê?.. Ez ê U vir ziman hîn bibim û pasporta xwe bistînim.

Bes e! Şeş meh in, bi çi awayî be jî ew ê biqedin!» Di vegeerê

de xwest têkeve cadeke din, lê her ku (Ugêhişt kuçên cadeke piçûk û dawiya wê jê ve xuya dibû, dilê vn jê (Uşikest. Di xwe de mijûl bû: «Dibe

ku îro betlane ye, loma kes (U kuçan de tune û piraniya dikanan girtî ne!... Lê ma îro çî roj e?... Şemî ye, yekşem e..?)» Hewl da ku nas bike ka ev çî roj e, lê <i>Uê wî U encama gumanên v/î rûnedinişt.

Mircan (U şopa xwe de vejeriya. Li pêşiya foyê tilmekî piçûk hebû. Beriya ku bigêhîje tilmik, xwe bi xwe got: «Heger ne ji vî tilmikî bûya, min ê serê Waw^o, ji aUyê bajêr, <U pencerê re bidîta!...»

Li ser tUmik hinekî rawestiya, weke ku wênê nexşê bajêr serê xwe de bicivîne... Gundekî mezin, cada dikanan, berjor û berjêr di nav re diçe, û li dor 10-15 kuçên piçûk ji aUyê rojhilat û rojava de jê diçin. Li dervayî bajêr, ji hêla rojhUat ve, dehl û zinarên mezin xuya dikin û ji hêla rojhUata jorîn ve, kavUekî dêreke kevnare, dûrî bajêr e... Wekî din jî havnrдор, şûvên dora wan darkirî ne... Piraniya xaniyên bajêr, yek yan jî duqat in, tenê U paş foyê şeş heft xaniyên sê çar qatî hene...

Li ser tilmik bêhnekê rawestiya, U dora xwe nerî. «Erê,

29

erê... Dawiya emrê xwe, min BabUon jî dît!» Ji nişka ve çavên wî U du reşan ket. Ji hêla sûkê ve keçeke 14-15 saU, bi zarokek 6-7 saU re hêcU hêdî ber bi wî ve dihatin. Keçik hîna bi qasî deh gavekî dûrî wî bû, weke ku ji xwe re tiştêkî xerîb bi-

bîne, çavên wê ji çavê Mircan demediket. Mircan jî, bi şabûna ku meriv bi zarokan şa bibe, bê^ tu mane, lê dinerî. Gava (ii ber re derbas bûn, keçikê meşa xwe giran kir, lê lawik ew circirand. Mircan, bi xwe fam kir ku keçikê dixwest pê re bipeyive, yan jî pirsekê bUce. Lê dema serî her du sê gavên ku jê dûrdiketin, keçUcê U paş xwe dinêrî û (Ubişirî. Mircan bi mebesteke din mijûl bû... «Keçik kamU e..!» Awirê xwe ji dû qut ne kir. Piştî 50 gavekî, U ber deriyekî kesk, rawestîyan û keçikê bi mebesteke taybetî, lawik derbasî pêşiya xwe kir û U Mir-can nerî.

Dûre maçî destê xwe kir û pif kirê. Mircan bi matmajîn bişirî û bê hemdê xwe ji ramûsana bayekî re serê xwe hejand. Dûre bi xwe keniya, serê xwe xiste ber xwe û çû

foyê.

IV-

«Hemû biyaniyên polîtîc, ji kerema xwe re ciakevin dersa ziman! Hemû biyaniyên poUtîc, ji kerema xwe re werin (Ubistana zimên..!)» Ji nav zimezima dengê pîrekekê, bi zimanê înglîzî û fransî, Mircan ev gotinên ha ji operloyê bihîst û diire jî ji nav ciyê xwe çeng bû. Bi çengbûna wî, diwaserê wî jî ji

xew rabii û jê pirsî:

- Mirza Mircan, seet çend e?

- Neh û nîv e!... Ez bawer im, em dereng man. Pele bike, em herin dersê!...

Wawîco serxew bû, dengê wî yê qalmd, ji nav lêvên cew(U-kî kirin çelpeçelp:

- Pele neke! Muheqeq, em ne yê dawîn in. Yan ne, çima (U operloyê de, em bi nav ne kirin? Helbet hîna kes ne çûye! Gava Mircan û Wawîko derbasî «dersxanê» bûn, dersê hîna dest pê ne ku-i bû. Li dor 10-12 meriv, pîrek û zUamên biyanî, di hundirê dersxanê de weke şeweyê tipa «U» rûniştî

30

bûn û du jmikên fransî jî (U navîna wan de, şîpiya bûn. Pêşiyê Mircan fikirî ku «Gelo çima du mamoste ne?» Lê piştî bîstekê, fam kir ku yek mamoste ye û ya din midiire ye... Yek ji wan gelek sipehî bû û ya din naşêrîn bii. Ya sipehî bi înglîzî-ziyeke şikestî pirsî:

- Hûn yê kîjan odê ne?

Waw<sup>o</sup> berî Mircan bersîv da:

- Oda 17a.

- Navê we û welatê we?

Gava Wawflco dîsa berî Mu-can bersîva xwe (Uda, Mircan (U xwe de mijûl bû: «Gelo pê<sup>^</sup> bêjim, ez kurd im û diîre ji filan welatî me, yan ez ji filan welatî me, lê bi netewa xwe, ez kurd im?») lê beriya ku biryarê bide, jînikê berê xwe da wî û got:

-Tu?

- Ez kurd im!

Jinika tenîştê, ya naşêrîn bi int û şida gotin sitend û bi îng-Uîziyeke paktir pirsî:

- Welatê te, Mîrza. Welatê te yê ku tu lê çêbûyî? Te fam ku-?!

Mircan ma behetî: «Ev ya ha, hîna navê min nas ne kiriye, bi ser min de radibe, dûre xwe serwext kir: «Belkî berî min, hinekan ew xeyîdandi be..!» Lê bi zarxweşî lê vegerand:

- Ez ji Iraqê me, lê ez bi netewa xwe kiud im! got û bi hêmin U çavê jinika naşêrîn nerî. Dûre bi wî şêwejî jî, nerîna xwe bir ser jinika ku ewU pirsî.

Te ê bigota qey ev zarxweşiya Mircan U mereqa ya naşêrîn ne hat, serê xwe xwar kir, herdu destên xwe vekirin û xwe U ehmeqiyeye şeytanî û meqerisyieke kor girt:

- Min fam kir, Mirza, min fam kir, lê paspor...

Negîha ku pirsî xwe bibe serî, jînika sipehî gotina wê birî û weke ku tika bike:

- Janêt! got û bi fransî pê re peyivî... Dûre vegeriya ser

Mircan: Kerem bike, ji xwe re U ciyekî rûne Mirza!

Mircan serçimandî çavê xwe U cnyekî gerand û mitale kir:

«Xwezî ez kerek bûyama û min ev çend gotinên îngilîzî jî ni-

31

zanî bûya!» Li kêleka Waw<sup>^</sup>oyê ku berî wî rûnişti bû, bi d bû.

Bi gotina jinikê, ya dawî, Mircan wusa bû, mîna ku tu wî (U ava sar de bUcî. Bi heyr û matma<sup>^</sup> (U navbera xwe û nefsa xwe de pirsî: «Gelo çima ev jinika bi navê Janêt ji min tengizî?... Ew ji navê kurd tengizîyan bi temamê biyaniyan re wiha bû? Na! Muheqeq ew ji kurdan tengizî ye... Yan ne, çima Wawflco bi xweşî derbas bû û tu serêş jê re çênekir?... Bi aqilê min beşera min pê re xweş bû!?» û ji nişka ve lerza nava Mircan tewirî: «A.. Pasportê! Pasporta min ew şaşomaşo kirine. Na xwe loma jinikê pirsî -pasporta- te. Wê muheqeq, beriya ku bê dersxanê, kexizên min xwendine û dUê wan U min rûneniştiye.»

Mircan cU wê bîstikê de xwe serwext kir ku ûştê tengizandina Janêtê ew bû ku jê re pêşiyê ne got, ka ew bi kîjan pasportê derbasî Fransayê bûye, lewra ew bi pasporteke ne (î)î, ji Bulgaristanê hati bû Fransayê. Xwe bi xwe kete ramanê: «Lê madem ku vê bêbavê zanî bû û kaxizên nun xwencU bûn; çima bi rehetî U ber guhê min ne xist?!... Min berî niha, hertişt bi rast û ronî di nama xwe ya fltîcayê de ji OFPRA(\*)yê re nivisandi bû!... Lê baş bû ez ne hatim provokasyonê û ez zêde ne axivîm û li pêşiya endamên dersxanê, yên nenas, min hertiştê xwe ne got!»

Mircan, bi her awajî di ber dUê xwe (Uda û hercarê bi awakî U ser gotinên Mecîd û Felît difikirî: «Ew kesên ku min qerfê xwe bi zanebûna wan fikir... Ji min baqUtir derketin... Heger min ji wan bixwesta bi wan re bimînim, ew ê ji kêficweşiyê bireqisîyana û ez jî ne diketim vê rewşê!»

Gava herdu jinik bi hev re dipeyvîn, Mu-can cU bin çavan re li wan dinerî, weke ku hewl bide hinekî ji rewşa wan fam bike: Janêt, jineke navsere bû, bi bejna xwe jî orte bû. Porê wê yê hîlikî, kert-kertî kurkirî bû û du reng bû. Kerta ewU, cUrêj ji qatê serî heta ser guhan porekî zivir, zer û Uhevgerîyayî, (\*) Rêxistineke firansî ye. Li dijî apartheîdê û ji bona mafên penaberan xebatê dike.

32

weke yê bizineke hîtUc bû; kerta din, ji jênîkê heta kortika dîza paş hustuyê wê, rengê wî cûn bû û bi tof bû. Mîna pirêza ku nii derasê ji nav dabe aU, dihat xuyakirin. Çavê wê weke rengê gola şelû, ne zer û ne jî hêşîn bii. Lê jinika din, te ê bigota ji wêneyên hunermendên Europiyên sedsala noztian e. Ciwanbûn û sipehîbûna wê klasîkî bû. Dêmekî şîrî, hinarûkên bi rengê gula pembik, bejinzirav; û porê wê yê zer î şima^ weke gUokek tayê nexşan U paş hustuyê xwe civan(U bû. Çavê wê hêşîn, weke zelaliya esmanê sajî.

Mircan piştî ku bi hûrnerînê U rewşa wan meyizan(i, ji xwe pirsî: «Çawa ev horî û ev cinawir (U organîzasyonekê de bi hev re kar dikin?»

Herdu jinkan axaftina xwe dom kirin. Biyaniyan jî guhên xwe miç kiri biin, geh U wan dinerin û geh çavê wan yên belo-

qî, tev pirs û gumanan weke sitiriyana di laşê Mircan re (Ubûn. Lê ji biU end^ Mircan tişteki dm tê de ne (iUebitî: «Gelo ev cinawir ii ev horî U ser min çi dibêjin? Gelo ji wan ê kî zora kê bibe? Gelo ew heta kîjan qonaxê kiu-dan nas dikin? Ew bi başî wan nas dikin yan bi xirabî?» U carina jî cegcT dihanî xwe: «Ma ew ê bi min çi bUcin? Çi ji destê wan tê? OFPRA bi hertiştî dizane, min derew U wan ne kiriye! Ma ne gerek ev nebixêra Babilonê, tenê ciyê xwendina zimên û xweragirtina U benda kaxizan be!? Tişteki ji destê wan nayê. Tişteki nabe!» Zêdejî çarîkekê derbas bû û rewş weke xwe ma. Bizina piyoş dikir pitepit û her carê berê xwe bi Mircan ve dikir û ya sipehî her carê bi hêmen tişteki jê re (Ugot û ew serwext dikir... Di wê rewşê de, tişteki weke nerînên mûlteciyan bi Mircan giran ne dihat. Ew jî di bin nerînê wan de melûl bû bû û nizanî bû ji heyra wê berê xwe bi kuderê de bike. Her ku dem diçû rewş pê girantir dibû û laşê wî hişk (Ubû. Ji nav nêrînên biyaniyan, tenê nerîna Artîxil pê xweş dihat. Di wê navberê de du sê caran çavên wan li hev diketin. Cara dawîn ArtîxU bi mana piştgiriye serê xwe jê rc hejand û bi dengê nizm, (U ber xwe de bi "kurdr got:

-Heyir welleh yaho... baş..! baş... Tirs na!

Mircan bêhneke kûr kişand, di nava xwe de qijirî û bi şe-

33

wat ji xwe re got: "Xwedêyo! Ew se^av çi ji min dixwaze vê sibeha ha?" Û pê re jî te ê bigota, weke rîsekî zivir U qirika vn hatiye ş(i)ian(iin. Bi xwe re ket giunanan: "Heger ez bipeyivim, dengê min nema tê bihîstin!..." Qirika wî xiUya û serê vn ket



ber. Nema karî bû U kesî binêre, û TUiirê serjêkirî, nayc êşandin bi rewisandinê!"

Di dersxanê de, ji hêla ku ArtîxU lê rûniştî, dengê bUind bii ti xwe(Uyê deng bi fransiyeke şikestî, xwc dada hcrdu jini-kan. Gava Mircan serê xwe rakir dit ku herdu jinik U ArtîxU dinerin. Mircan bi heyr bîr kir: "Artmlê şinik, wa ye hinekî bi fransî jî dizane!..." DUê wî hinekî êşiya: "Heger ev (îikê şinik, xwe tev problêma min bike, wê rewşa min xirabtir bibe!" Lê te digot qey ew ne U ser wî dipeyvin, çavên wî vajovajo bû û tiştêk fam ne kir; weke ku nc tiştêkî dibîne ne jî (Ubihîze...

Gava

(U

dersxanê

de

teqereq

hat,

fam

kir

ku

bû

katê

bêhndayînê ye. Teqnekî ling ^êdayî ma û ji wan gotinên ku

ArtûcU

(U

êrîşa

xwe

de

bikar

dihanî

"pour

quoi,

pour

quoi?"(\*), (U guhên wî de dikirin vizîn.

Wê rojê heta danê êvarî jî rewşa Mircan bi ser xwe ve ne hat. Janêtê hemû wext di hînkirina nîvisandina acircssê de qedand. Ê madam Laplas jî nema diyar bû. Mircan tiştê ji qcrebalixa ser xwe fam ne kir!...

\*\*\*

"Roja xweş ji sibehê de xweş e!..." Roja pê^ ji Mircan re, bû weke mestera rojên dahatî. Wî xweş fam kir ku bizina piyoş, ne tenê naxwaze biyaniyan fêrî ziman bike, lê bi her awa^cUke ku Fransa û zimanê fransî U ber çavên wan reş bibe. Her ku dem (iibuhirî, kezebreşî zêdetu- (Ubi.

Bizina hîtik ê her roj seet U neh û nîv, dehan tev kûçikê xwc ê (carina dudu bi hev re dihanîn dersxanê) derbasî dcrs-xanê biba û gotina wê ya pêşîn, ji dêvUa sUavê ve wê ê bigota; "Alors, fermez votr lîvre!"(\*\*) Di çend rojên pê^ de xwen- (\*) Bifransîye,têmanaXi'naT"

(\*\*)Bifransîye, mana wê ev e: Ba^ e, de pirtûkên xwe bigirin.

34

dekaran wusa guman dikirm ku ev gotinana sUava wê ne, lê gava cw derbas dibû ii ku hinekan pirtûkên xwc hîna ne girti bana, wê xwc bi hêrs da(Uda wan û bi xwc pirtûk digirtin. Wê çaxê hcmûyan mana van gotinan fam dikirin. Ê piştî wê, wê ê ji ser dUê xwe, ristek dudu bihaniya ser ziman û ji xwendeka-

ran bixwcsta: "Bi dii min de bêjin" dûre "Ycko yeko bi tena xwe vegeînin!" Û yekî ku pê rc nçgêhanda ew hevoka U ser hev bigota, wê ferman (iihanî scrê wî; "Hiln ji zimanê fransî hez nakin!.. Hûn naxwazin fêr bibin!..." digot fl agir ji devê wê (iiçû.

Carma, gava ku dereng dihat û hinek (U dersxanê de ne hazû- bûya, wê bi lez berê xwe (Uda îciarê û bi mikrofonê, (U- kir qîjewîj: "FUankeso!... Xwendinê dest pê kiriyc! Herc U welatê xwe razê, vîr ne ciyê razanê ye!" Û ku ew rcben bihata, bi sari cw direwisand û digurand. Di herdu hcfteyên pê^ de, bera du biyaniyan da. Bi ûştâ "nexwcstina wan, fêrî zimanê fu-ensî bibin!" Wê çaxê jî biyaniyan hemûyan bihîstin ku midûre, madam Laplas, xweha bizina piyoş e û çî bixwazc (U- ke!

Bi vî awayî meha yekê derbas bû, bêyî ku biyanî fêrî tiştckî bibin, ji bilî elfaba fransî, nivisandina adresên xwe û çend gotinên bingehî. Lê te digot qey giştan dersekc xweş ji "rewisandma" Mircan ya roja yekê sitendm. Ku bizinê quloçê xwe U kê rabUcira ew ji ber ne difilitî, heger mirêsê xwe ne kiri bûya wek yê Mircan, roja yekê.

Di gel ku piraniya biyaniyan dema pê^ tiştck jê fam ne dUcirm, lê mirês û rûçikê wê, bê şirovekirin pirs U ber wan da- dUianî: "Çuna tu hatiyî Fransayê? Te U welatê xwe çî kiriyc? Hûn nabînin ku fransî tev betal m? Hûn nabînin ku fransî U hin bajarên Fransa bûne "kêmanT? Ncwêrin bi şev ji malên xwe, ji ber serseriyên bêgane, derkevin!?... Çima hûn narm welatê xwe, yan jî welatekî din!?"

Serî her çendekî dora "rewisancUna" yekî dihat. Mircan jî, te ê bigota ji roja yekê ve zengeloka vn hat birîn. Bi carekê re gotm jê çênedibû. Gava di dersxanê dc "şer" dest pê cUkir, wî serê xwe dixist ber xwe û bi nîvriihî (U rewşa xwe dc difikuî. 35

Dengê bizina piyoş nema matmayîn pê rc dixuUqand. Ew hînî hemii fêlbaziyên wê bîi. Lê tim û tim pu-sek (U serê wî de dixi-Uya û nikari bii iişta wê bibîne ku "Gclo çima bizina piyoş (U roja pêşîn de dest bi rewisandina wî kir?"

Carekê, piştî dersê, Wawflco, weke ku qerfan bUce, jê re got: "Sekretera medam Laplas, Fatîmayê îro U te pirsî, te ew dît?"

Tu temahiya Mircan <ii Fatîmayê de weke yarekê tune bû. U çawa ku ji karkerên welatên ereban bi saw bû, wiha jî v/î xwe ji Fatîmayê vedikişand. Ê tu sipehîbîina wê jî tune bû ku ew bi ser xwe de bikişanda. Ji roja pêşîn fl pêve jî, tu carî bi (iirêjayî bi wê re ne peyivî bii.

Gava derbasî îdarê bû, Fatîma bi tena serê xwe bii, Mircan xist dilê xwe ii xwe bi xwe got: "Ez ê îro jê bipirsim bê çiqasî rehên erebî tê de mane?" Lê keçikê berî wî U rehê v/î xist.

- Misyo Mircan!... Aniha bi rastî jî tu bi erebî dizanî? Bi-bore, ez vê pirsê dikim ji ber ku beriya niha jî, madam Laplas û Janêt li ser vê yekê keti biin qirika hev! -Bêjî ku xwe tev bi-de, ji pişt masa xwe pirsî û serê xwe xiste nav kaxizan.

Mircan di ciyê xwe de bii weke ku tu wî bi bizmaran bikutî.

Tu bersivên wî yên amade ji vê disergirtina erzşikênan(Un û pirsî bi guman re tune bîin.

- Matmazêl Fatîma! Ma tu bi crebî zanî? -Bêjî ku tu mebestan di dilê xwe de bimeyîne, weke wê bi îngûzî pirsî.  
- Na! Bi daxawa, ez bi erebî nizamim! Lê te mebesta min fam ne kir! -Zarava wê hat guhartin, piştî ku reheUna zarava Mircan ji qirika wî bihîst- Mebesta min ji pirsê ev e ku: Heta niha, ji cerga ev foya hatiye avakirin, ji biU te, ji welatên ereban tu kesekî weke te biyanî ne hatiye!.. Em zanin ku U hin welatên ereban partiyek tenê, Partiya OU (U mixalefetê de ye. Me çend endamên wusa, U Parîsê û deverên din bihîstiye. Lê bes tu, ne zilamekî oldar î, tu ji Bulgaristanê hatiye. Heger tişteke (U vê dagoşê de hebe, ji min re bêje, bi ehd ez ji kesekî re nabêjim!

- Matmazêl Fatîma! -Mircan gotina wê bi aramî qut kir-  
Ez kurd im! Heger tu dixwa^ U ser kurdan tişteke nas bucî, ez  
36

karim navê çend pirtûkan bi zimanê fransî bidime tc. Lê heger heta niha, te tişteke U ser wan ne xwencU be û ne bihîsti be, bi daxawa, bi axaftina me ya niha, ez ê nikari bim tişteke hêja ji te re bêjim...

Mircan gotina xwe dirêj kir; geh ji dîrokê, geh ji coxrafya û geh ji rewşa dvakî û poUtîka gelê kiu-d nemiine dihanîn... Û (U dawiya axaftina xwe dc pirsî:

- Na xwe ji ber vê yekê mamosta ziman, Janêtê, (U roja pêşîn de ew hiner anîn serê min?

- Na! Na! -Bi ken înkâr kir. Ez ê ji te rc mcsclê bêjim, got û gotina xwe berdewam kir. Ev xeysetê wê yî kevn e. Ew ji biyaniyan hez nake. Her grûpeke nû ji biyaniyan tên, ew dest

bi şerê wan dike, wan çavtirsonekî cUkc û dûre weke gogê, ji xwe re bi wan dilîze. Kes nema ê<i>î (Uwêrc tê hUde û U ber wê rabe! Te fam kir? Tu guh nede wê. Ew cUneke beradayî ye!... Fatîmayê gotina xwe U ser Janêtê dirêj ku lê dawiyê bi (U-lovanî got:

- Tu zanî!... Bila Janêt ji te re nebe mestera fransiyan.

Fransî şerîftirîn millet in. Tu zanî ku biyaniyan çavên wan derxistine?.. Cak Şîrak, reîsê bele(Uya Parîsê, (U axaftineke xwe de U pêşiya xelkê bajarê Marsfliyayê got: «Heger xelkê bajêr dengê xwe bidin min, di hilbijartina seroktiyê de, ez ê bikim ku xelkê Marsfliyayê kengî bixwazin, ew ê bikari bm ji malên xwe derkevin!»

Mircan wê çaxê di dilê xwe de got: «Janêt nc tenê ez çavtirsonekî kirime, wê qidîmê min jî şikêand! Heger ji nû ve ez serê pisîka jî li ber hilqetînim ncm feyde (Uke!» Lê wî bi carekê re jî destê xwe ji dibistana bizina piyoş şûşt ku bikari be fêrî ziman bibe. Çîî^a dibistanê jî, danê sibehî û yê êvarî, jê re bii barekî giran. Wî tev kasetan putîUcek «Hînbûna zimanê fransî bê mamoste» kirî û roj bi roj cU zanebîna ziman de xurtu- bîi.

Di wê demê de, Mircan bi gelek tiştan mijîU bû: ku namekê li ser rewşa xwe ji serokwezîr re bişîne; ku ji serok komar re, yan ji organîzasyona OFPRAê re. Lê ji ber du tiştan her tim bêçare dima: Ji ber ku ji wan kesên bi wî re, ji tu yekî jî

37

hêviya poUtîkî û zanebîinê ne dikir -U gor tégêhîştina wî, pira-niya biyaniyan bi mebestên ekonomîkî ftica kiri biin; û ji ber

ku kesên hêviya ji xwe bikc û U dora wî rêz bin, timc bîin. Yên U ber çavan cUsa ArtûcU û Emîn biin, lê wan jî çavê wî danc(U-<sup>^</sup>tin.

\*\*\*

Di gel ku Mircan piştî «dersa» pêşîn, bi awayekî hewasbel-qitî û bêserî çû (xla xwe, lê birîna wî di hun(iir dc bû. Laşê vn giran bû û xwe tev ne (Uda. Lê tc digot qey, yê ku pozê wî kct pirikê ArtûcU bû. Wê êvarê, v/î çay U («m xwe çêkir, piyalê ji du sê oada da hev û anî U (xla Mircan danî. Te ê bigota hatiye miezê. Derî jî U pişt xwe vekirî hişt. Mircan bala xwe dayê ku Wawîko, her orta bîstekê û bîstekê, bêdeng radibe derî (U-gire, lê Artîxil, bêhneke kîir dikişîne û bi int (Uçc derî vcdike, weke ku bayê hundir waca nava wî hênik nakc... Cixare ji cixarê vêdixist û tebatî ne diketê. Geh ra(Ubû, geh rûdinişt, wekc ku keleke guan wî hUtîne û datînc. RûçUcê wî jî bi hUanîn û danîne re cUhat guhertin: Geh bi nueztî (U bcr dUê Mircan (Uda û gotinên wî yên kur(U zaqif U hev siwar dihatin: «Ne tişt... Devrimci hal devrimci, şoreşgerî tczhîyet lazim... var! Yaho

Fransa...

Ax!

Fransa şerefsîz!

Rasîzm valla

rasîzm!

Baş... Baş tune! Ne tişt!» Carina jî rûçUcê xwe dikir weke yekî ku gefa U hinekan bixwe. Wê çaxê, destê xwe yê çepê bilind (Ukir, dikir kulm û dihanî ber çavê xwe: «Imperyalîzm aynî. Kapîtalîzm aynî... Turkiye, Firansa aynî! Mûcadele U Tirkiya

û Fransa aynî...! Em herin pêş Mircan, em herin pêş, dem û dewra me ye!» Welat, azadî, sosyalîzm U benda me ye... Erê weleh...!

Emîn jî li kêleka wî bû. Artîxil çî bikira, weke wî dikir; çî bigota, wî ducar diku-... Rabîiya radibû, rînişta rûdinişt... Te ê bigota siya wî ye. Çawa tevbigeriya siya wî jî wUo tevcUgc-riya. Tenê cudayiyek cU navîna şexs û siyê de peyda dibû. Yê ewil bi hêrs digot û dikir, yê (Un sist dikir û bi dengê zîxanokî digot. Carina jî gotinên ArtîxU werdigerand zazakî -ji bo ku Mircan baş têbigêhîje! Ê jê dipirsî jî «ti fam kenê?...»  
Mircan wê şevê ne tişt ji xwe û ne jî ji rcwşa mieziyên xwe  
38

têdigUiîşt. Wî tenê fam kir ku ev herdu ehmeqên ha, heger «herin heyfa sinbêlê wî, ew ê riya wî jî U scr kin!...»  
Ê carina cU hişê xwe de (U rewşa ArtîxU û Emîn de bi awakî feylesofi ciifikirî: «Merivê bindest be û nc azad be, tu carî xisletin merovtiyê bi tamamî cU şexsiyeta wî dc peyda nabin. Wê peyvên wî ne yên wî bin, hêrsên wî nc yên wî bin û tu caiî bi hiş û aqUê xwe nikari be hikim U tevger û lebata xwe bike...  
Emîn siya Artûdl e û piraniya hêzên çepên kiudan (U dema hazir de siya çepên hêzên netewên serdestên ku şexsiyeta xwe ki^ ne kirine û bi hemû awayên xwc cU bm tasîra wan de diUvin. Ev ji bo tevgera kiudî, rewşekc pir gu-an û çetin e. Heta çepê kurd şexsiyeta xwe peyda neke û xwe bi şertê hebîina milletê xwe gewde neke, ew ê nikari be bibe xwediyê tevgera konevaniya milletê xwe.»  
Kat bi «mieziyan» re ^ran diUviya. Her çiqasî Mircan



hewl dida ku xwe bi mêvanê xwe xweş bike, yan çepsancUna gotinê wan bike, lê bê sîide bû. Di xurcika gotinê wî de tiştek U rewşa wan ne cUhat. Ji wan xweşgotinên ku dikir, ji biU: «Erê, baş, sipas, însallah!» U tiştekî din rast ne cUhat. Te ê bigota zimanê wî ji bUî van gotinan, tiştekî din nikare bikar bîne. Piştî ku kat teqnekî derbas bû, Mircan çavê mêvanê xwe de nerazîbînek xwend. ArtixU eşkcre dawa qisekirinê lê kir: «Qise yaho!... Dunya, mucadele ha!»

Gava bîstek kin rawestiyan, Mircan ji nişka ve xwe gunehkar dît û pê hesiya ku li hemberî mêvanên xwe kêmasiyê dike. «Gerek e bi kêmanî gotinên ku ew dizanin, bikar bînim! Hema hinekî bi wan re bipejavîm!» Dûre ji xwe pirsî: «Ya Rebî ya îlahî... Ez ê ji wan re çi bêjun? Çi ji xeynê durişmê bê^yan û şehit bi van gotinan derdUceve?... Xwezî qe min gû xwari bûya û U pêşiya wan ne goti bûya: ez kurd im!... Ev doza çi U min dikin?... Ez ji ber barana bi roj xelas ne bûm, mezriba êvarê dest pê kir!»

Di wê bîstekê de, mîna ku Mircan hemû merîfet û zanebîna xwe bi^vêşe, di hişê xwe de U babetekî munasib geriya ku bikari be bi gotinên xwe yên «tirkî» û kurcU bêje. Li tiştekî rast ne hat: «Way koranî bi çavên we de bê! Ma hîin ker in!

39

Hûn nizanin ku ez bi tirkî njy^nim

Hîin çi dawê U min dikin

lawo!?... Hiin bi eşkere ji min dixwazin «qisc... qise!» Diire ji

xwc pirsî: «Gelo ev yên ha U ser min çi difikirin niha?» Lê

ArtîxU nema xwe girt:

- Tu kurd î ha!? pirsî û bi çavekî ku xezeb jê cUbarî, awir (U Mircan vedan.

Mircan bii weke ku tu wî (U ava sar de bUcî. Mûyê laşê wî rabûn û nema dizani bii wê bêje çi. Divê bêjc «Erê» îm «Na». Devê wî ji hev vekirî ma û bi çavên xwe yê matmajî U ArtîxU nerî... Tiştêkî vî ArtîxUî, (U wê nerîna wî ya wê sibeha ku (U dersxanê de U Mircan nerî, (gava öi nav lepê bizinê de) tev tune bîi. Hêdîka ji ciyê xwe rabii, derî girt û (Usa bê deng (U ciyê xwe de weke berê rînişt...

Lê ArtîxU, te ê bigota hindUcek ji taUya miraqê Mircan giyayê û hilma şewata nava wî çiiye... Piçekî ji hişkiya xwe danî û berê gotinan guhert, lê dîsa bermeqlubî U wan siwar hat:

- Na!... Ez ne kurd! -destê xwe U sînga xwe xist û şirovekirina xwe berdewam kir- Ez, Turk, lakîn ez û tu heval, yanî kardeş!... Baş... Heval... Yanî yc.daş... -destê xwe ku- kulm, weke ku di xwepêşendanekê de du-ûşman hUdc û bi hezaran meriv U dora wî bin!

Emîn behetîmayî keniya:

- Yahoo... Aaaa! Yanî yoldaş ti fam kenê?

Mircan serê xwe hêjand:

- Erê! Sipas! -îi riiçikê xwe jî kir weke guhdarê ku gotinek jî ji ber nare. Ê di nava xwe de qiçqiçî.

Artîxil gotina xwe berdewam kir:

- Kurd, turk aynî memleket... Yoldaş, mucadele kontr-emperyalîzm. Kurd turk fark yok!

Artîxil wê şevê peyv sipart xwe. Biyaniyên ser qat, ku ji wan fam ne dikirin, her carê serê xwc di derî re derdixistin û hilma axaftineke polîtîkî, pir cicU (Ukirin û Mucan dûa dikir

«Xwedêyo ew ê ken<sup>^</sup> ev ehmeqên ha dev ji min berdin û min rehet bihêlin?!» Lê wî xweş fam kir ku ew bi çi awajî nera<sup>^</sup>-bûna xwe diyar bike jî, ew ê ne xêr be. Ma, tenê di hûiavê xwe de biqîçqîçe.

40

Mircan (U zarava pirsar ArtîxU de, ya ku «tu kurd ha!?» bê-hawetiyêke har, hov û kor dît. Lê gava dît jî, ku (U eynê katê de ArtîxU bi hemû hêza zanebûna xwe û lojika xwe, berê gotinan diguhêre, <ii (Ulê xwe de got: «Işev çawa be jî cz ê biqedînim. Lê heta ji min bê ez ê xwe diirî wî bixim!» U sonda ku U hotêla Parîsê bi xwe re dabii, (U serê v<sup>^</sup> de lal bû. Dixwest ku tenê «ev ehmeq U parsiyê min nexer, wekî din, çiqasî perwertiya xwe bi tov bi ser kurdan de birjîne, ne xem e!» Ê carina jî, xwc bi xwe (Ugot: «Hema pirsan neke!» Ji ber bala vn qet ne lê bû û qet jî mebestên viyaU û wiyaU gotinên tazî, fam ne dikir.

Rcwşa vê rojê, (U pêwendiyên Mircan û Artûdl de dom kir.

Heger «baranên rojê»

peşk di<sup>^</sup>yandin Mircan, «mezrîbên

êvarê» bi dilop û şîrîn bîn. Ê Mircan ma, geh destê wî U ser parsiyên wî, geh li ber ruyê wî... Xwe ji herduyan jî disitrاند. Lê...

Jiyana bêgane, bi pêhatinên xwe nenas e!... Çamroxê bêbinî ye, tu çiqasî pê de herî, tu ê tê de wenda bibî...

Hertişt tê

de ne qamkirî ye. Hertiştên wê, tenê li gor kesên bê tiştê in! Mircan di hokirina xwe de, ku hawê melevanê vê çamroxê bi-

ke, roj bi roj, hawên şîrîn, yên gîyanê xwc, yên sixlet xwe win-  
da dikir.

Ji çend rojên pêşîn pêve, wî nema kiravata xwe dixist hus-  
tuyê xwe, nema cUê xwe ûtî dikir, nema meşa xwe ya berê cU-  
kir! Wî bawer kir, wekî «gerek e per û baskên xwe yên zêde  
jê bike, heta ku bibe mîna kesên dora xwe!».

Di hefta pêşîn de du sê caran bi ArtîxU re diçîin dikanan,  
xwarin dikirîn, U dora foyê digeriyan... Rewşa wan, ji aliyê  
derve de hêdî hêdî wek hev dibû. Cudayiyek tenê di navbera  
wan de xweş diyar dibî: Yê ku dipeyvî tim Artîxil bû û yê ku  
serê xwe dihejand jî tim Mircan bî. Û jiyana bi hev re, li ser  
qatekî, <ii dersxanekê de... çiin û hatm zêde kir. Gotinên Ar-  
tîxil, yên kurdî bêtu kir û rasthatina MUcan U gotmên erebî,  
cU tirkî de, bêtu kir; sermîyanê wan ji gotinên fransî jî zêde  
dibî.

Êvarekê, Waw^o xwe U ser textê xwe ciirêj kiri bû û Mir-  
41

can jî putûka xwe ya ziman dixwncd. Ji nişka ve tcrpînek xurt  
ji dîwarê wan yê hêla oda ArtîxU hat. Wawîko ve(3niqî, U qûn  
riinişt û bi zarekî lomedar got:

- Mîrza Mircan!.. Tu zanî ku ez gelekî qedrê te (Ugrim, lê  
ku tu rastiyê bixwazî, kêfa min ji van xeUcê tc rc nayê. Ji wan  
rc bêje, bUa van bêhawetiyên nekin û bUa çiin û hatina wan jî  
U oda me kêmbibe!...

Mircan xwest yekser wî serwext bUcc ku ew jî nc mcreqda-  
rê wan e. Lê daxuyakirma gotma «xeUcê te» bi wî, pêwîstir  
dît:

- Mr Wawwko! -bi nermî hatê- Berê hcr tiştî, cz û wan ne ji xeUcekî ne. ArtîxU tirk e, ez kurd im. Emîn jî weke min kurd e, lê bi kurdî nizane!

- Ez ferqê nizamim, -bi aramî şirove kir- tu merivekî intelektualê î, pir kêfa min ji te re tê, lê ez bi tirkekî re mame, U Almanayê. Mm bi wan re kar kiriye, ez wan xweş nas dikim. Gelekî bêcir m!... Lê ma tuk û kurd nc yek m?... Ma nc hûn bi zimanekî dipeyivin?

Mircan keysa xwe U peyvê xweş kir û nas kir ku gelek jê re divê heta ku diwaserê xwe serwextî rewşa kurdan bUce. Lê terpeterpa dîwar dîsa xurt hat û dengê zûanokî ban kir.  
«Mircan!»

- Fcrq gelek e, Mr. Wawflco -Mucan bi lez got û xwe kar kir ku rabe bi ser gaziya deng de here, lê berê ku derkeve, bi awirê mişt bawerî U Wawflco nerî û got:

- Ez ê ji te re her tiştî şirove bUcim! Tenê ez hêvî dikim ku tu niha hinekîbêhna xwe fireh bUcî!

Gava Mircan derbasî odê bîi, dît ku ArtîxU perflcên neqşên rengoreng <i rengên celeb celebî, U ser masa xwe kom kirme. Ij sê çar plakata jî bi babetên «şoreşgerî» bi dîwar vc kirine. Emîn, destê xwe U hev xist û bi şabûna mindalekî û bi dengê xwe yê zûcanokî got:

- Yahoo... Yahoo... ArtîxU resim. Ecaîb baş yaho!... Ti fam kenê!?

ArtîxU bi gu-anî û heybeta hunermendekîşareza serê xwc ji ser plakata nîvcoya ku U ser masê rakir û bi nîvzîvu-andin bi

42

. ser Mircan ve zîvirî:

- Na! Ev gelek ne baş -bi madê tal, serê xwc hêjand- baş  
Turkiye var, -destê xwe bi hêla pencerê ve kir.

Miican bala xwe da wêneyan: nc xêzên wan, nc teknflc û ne  
jî babetê wan, yekî yek ne dixwar, ji hevdu ciireviyan. «Wê-  
ncyên ku zarokên dibistanên nizm çêdikin, ne kê m û ne zê-  
de!» - xwc bi xwc fikirî û cU pey re U ArtûcU nerî:

- Ma tu U Tirkiyê hunermend bîiy?

- Na! Ez Turkiye şoreşger -bi cicUyet got û berdcwam kir-  
lakîn şoreş herşey! -destê xwe bi zut di scr scrê xwe re bilind  
kir. Dûre destê xwe avêt rojnamekc tu-kî, navê wê bi xêzên  
sor û girs hati bîi çapkirin, «E.S.» û pelên wê qolapt. Hemû  
wêneyên

piakatên hundir yeko yeko pêş Mucan kir. Li ser  
wan wêneyên rojnamê, xêzên çarqozî, bi panayî û dirêjajî, tev  
jimarên kêlekan, (U ciyê xwe de ma bîin.

Mircan

xwe

bi

xwe

fikirî:

«Ev

himermendekî nc

tenê

efrandin jê nayê, lê nizane kopiyên bi xêzikên çarqozî jî çêke!

Diziya hunermendiyê jî jê nayê!» Lê rojname ji dest wîgirt û

serê xwe xist nav.

Rojname seranser bi wêneyê Stalîn, Enwer Xoce û Ramîz

Alîya ve xemilan(U bû. Rîipelek jî tune bû ku çavên meriv tê de yekser U gotina Albanya, geh bi tîpên gu-s, geh bi tîpên hûr û leç, ne keti bîiya. Di rîipelekî wê rojnamê de jî, nexşeyeke cîhanê mezin hebû. Tê de hemîi dunya bi rengê reş hati bû rengkirin, lê nexşeya Albanya tenê weke deqek piçûk, bi rengê sor bîi!

Mircan U ser wî rîipelî bîsteke dirêj rawestiya û bêjî ku serê xwe ji ser rake, pirsî:

- Albanya çend mfilyon e?

Emîn ber ve hat, li nexşeyê nerî ii weke şagirtê ku mebesta pirsê, ji ber xwe ve fam bike û xwe U pêşiya mamostê xwe bi-de xuyakirin, bi dengê xwe yê zîxanokî kir qideqid:

- Kuçuk, yaho, pir kuçuk! -tiliya xwe danî ser rengê sor û dûre bir ser dilê xwe û şirove kir -Albanya pu kuçuk lê qelp dunya... Qelp tîine, însan tîine; qelp war, însan war! Albanya tûne, dunya tûne! Tî fam kenê!?

43

Mu-can serê xwc hinekî bi mana «Erê min fam kir» hejand û (U sînga xwe de hummmmeke (Urêj bê mane kir xumîn. ArtixU xumîniya Mu-can bi maneyeke taybetî analîz kir:

- Tu çû Tîrana? -bi zarava mamostan ku ji şagirtan dipu-se, ji Mircan pirsî.

Mu-can cU dUê xwe de got: «Tir U ku û das U ku!» lê behetî, destê xwe ber bi xwe kir:

- Ez?! Tîrana?!

- Erê tu tu! -bi bawerî, weke ku wî bi çavê xwc, ew U wir dîti be çepisand.

Gotina «Erê tu tu!», wekc gurmîniya taveke buharê di ro-  
jeke saji de, ji nava Mucan anî. Ew pê ricifî û lerzeke sar laşê  
wî girt. RîçUcê ArtîxU jî piçekî ji baweriya çepsandina gotma  
wî dananî... Mircan xwe ji nişka ve dît weke cU hundirê gerze-  
leke hesinî de û dêm li dêm bi gurekî har rc. Xwe piçekî xur-  
cUand û keysa xwe xweş ku- ku (U devê derî re bédeng  
derkeve. Lê gurê har qflê diranên xwe qîç kirm:

- Çima tu na hiz dike qise yaho? Herşey marîfet ha! Ez za-  
ne! Tu hevalê Mecîd û Felît, U hotêl ha! Bi ew qise war  
«erê», bi ez qise «na», çima?.. Pour quoi? -bi zirtî serê xwe  
hejand.

- Qisên çi heyran? -lêv rehelî pirsî- ez ji te fam nakim, tu çi  
dibêjî?!

Gurê har serê xwe piçekî çimand, weke ku nêçîrê bide  
famku-inê «Ez niha te naxum!» û çavê wî bi xedir tev dan:

- Ez zane! Tu Apoçfler! Li Bulgaristan Ûnîversîtê tamam.  
Lê ez jî kurtçe zane. Kurmanc û soran û Rûsçe! Û dixwaze  
kurd serxwebûn! Ez qise dike, tu qise nake, doxrî dir? Rast  
dir?.. Çuna tu, ez çûn magazîn qise nakî?! Li foyê nakî! Her  
wext: Erê... sipas... însallah! çima? Ez casûs, Emîn casîis?  
Mircan behetî ne bîi gava Artîxil tuhma partiyetê anî ser,  
piştî hUdana navê Mecîd û FeUt. Herweha xerîb jî ne dît ku  
naskirina wî ya U ser xwendina xwe U Bulgaristanê. Lê cU ax-  
aftina ArtîxU de du tiştên dm bala wî kişandm: Çawa vî  
ehmeqî, heta niha ev tiştana (U xwe de guti bû û dernedixist?  
û pirsî ku: «Ez casîis?»

DUê wî êşiya ku berî nUia jî bêhnek



wUo jê kiri bû. Ew jî gava carekê bi hev re çûn dikanan, wê gavê ArtîxU bê<sup>^</sup> ku pirs jê bête kirin, scr fêrkirina xwe ya zimanê kurdî peji<sup>vî</sup> û got: «Ez (U nndanê de fêr bîim!»

Mircan, rewş da ber hev û fam kir ku niha çi bêje, ew yê xesirî ye. Lê wî nezaniya xwe ya ziman da ber ruyê xwe û futo futo ji hundir derket.

Ev cara duduyan bîi ku hewasê Mircan bi qercmûşkê ArtîxU birîn cUbiin.

Êvaran, (Ubû weke mişkê ku xwe ji ber pisikê vedize û veşêre. HUma ArtîxU U kuderê bUcira, xwe ji ser wî ciyê wercii<sup>^</sup>t. Sibehan jî berî hemû biyaniyan ji xew racUbîi, amadeyiya xwe dUcir, ji bo ku U serşokê yan jî U çeştxana qat, çav lê nekeve. Eywana tclevîzyonê, meşa hêdî U korîdorê û dengê bUind lê berimî.

-V-

Pajîzê perê xwe ji ser dêmê erdê da aU û demê bi mirêsên zivistanê aloz vedan. Roj kin dibiin û şev <iirêj. TUûrê şUbûyî dilerizî, baskên xwe yê şikestî bi dû xwe de dikişlcişand. Serma bêwaran dijwar bii, xwe berdida ser birîna parsûwan û qeremîşkên hewasan.

Pêşkên baranê û zirpîna meşriban qeşem girtin û nema ra U wan dibû. Dema ku danê êvarê dursa "rawisandinê" xelas dibû, Mircan bêdeng ji foyê dişemitî. Bêhêvîbi dUê sar (Ulerizî, digeriya û çavên xwe <iigerand U ser tiştên ku (U jiyana wî de tune bûn. Li hêlîneke germ, U çavên bi tîn, U bişirandina dêmên mirovî. Gava ku hinek pê<sup>^</sup> wî ciibûn, mîna kûçUcê bêxwecU ku bi vî awayê xwe parçek nanê xwe heq bikc, bi çav

û tevgera xwe dikir kazekaz. Lê U Babilonê ji kûçikên kedflicirî bêtu- tiştekan tune bii. Tu kesî U kûçucê çav^estî û bêqudûm ne dinêrî. Hertim jî di çûyîna xwe dc û (U vejerê de jî, U ser tilmikê pêşiya foyê meşa xwe ^an (Ukir. Carina radiwestiya ii çavên xwe digerland "Kanê ew çêlika însanan!" Wekc rçşikê şevê heta nizani bûya ku tebayê har xUmsş ne bûye, nc diçû lûsê. Ku nêzflcî foyê dibû, ew dibû weke keyjal, bi kêlekekê 45

(iimeşiya û ji biU ber lingên xwe deverek nc didît. "Hema ez sUavê bikim û cw venegerîne! Yan bêjc, tu çima sUavê U min dUcî?" Mircan pê bcsiya bû ku binck penaber jî, nexasim Wawî-ko û Emîn, guhrtinên jiyana wî (Ubînin. Ev yeka bîn pê girantir (Ubii, dema (Udît ku di dersxanê de dora "rawisandina" ArtixU nayê, û ku binekî demeg dimîne jî, bizina piyoş bi xUafi awayê xwe bi herkesî re "newqê jê vala dike." Mircan ji xwe re ev belbûn bi du tiştan tefsîr dikir: Yan bizinê hunerên çavên wî dît, gava ku (U dersxanê de bêla wî gUt, yan jî wê derbên "giu-ên har" berê dîti bû û xwe ji wan disitirand. Çiqasî ev wêne U ber çavên wî tarî bû jî, lê wî bêviya xwe qut nc (Ukir, wekî ew ê roja v^ bê. Mircan dengê xwe qet nema (Ubihîst. Hertim di bundirê nava xwe de bi xwe re dipeyvî û diket ramanan. BistUcên herî dirêjî ku tê de dcngê xwe (Ubibîst, bi Wawîko re bû. Pêşiyê jê rc U ser kurdan peyvî, piştî ku gotinên vn miçiqîn, çend goti-

nên bêmane tenê pê re man ûew jî dcma ku cw ji xew radikir digot. Danê êvarê jî piştî ku dibistan xelas (Ubû, jê rc digot: "Ji kerama xwe rc putûkên min bibe odê, ez ê berim ji xwe re bigerim." Ew jî ji bo ku U ser derencê an jî U korîdorê çav U gur nekeve.

Wawflco (U çavên Mu-can de zuavê wî yê qetya^ didît. Û cU demên pêşîn de beriya ku Mircan xwe ji teba vedize, jê re bi fort û payebûn pesnê jiyana xwe ya berî niba U Almanayê dida û digot:"Serên herî mezin, min pêlê fikirê, min bi peran dilîst. Min jin û zarokên xwc bi tamtika xwedî dUcir!... Lê niha?..."

Mû-can jî ji gotm, tevger û lebata Wawîko wêneyekî serast li ser şexsiyeta wî di hişê xwe de çêdikir: Beriya ku Wawîko ji Ganayê derkeve, çençihêkî serserî bû. Li scr karê reş, U ser kirîn û fuotina "giyayê kêfê" dijiya. Bi riya hinek nasên xwe digêhîje Almanya rojava. Pêşiyê U wir wekî karkirekî kar dike û dîre jî U karê xwe yê berê vedigerc. Li wir (Ube xwe(U jin û zarok. Polîsên Alman pê dihesin, wî (Ugirên û dixin zîndanî. Piştî ku du salên xwe di zîndanê dc (Uqedîne, dikevc ber  
46

efûyê, wî derdixin û dişînin wclatê vn. Ji welatê xwc cara du-duyan bi pasport fl navekî nû derdikvc. DibUiîsc ku U Fransayê serlêdana penaberiya polîtfîcî zfl qebiU dikin, tê vir!... Lê kaxczên wî zû bi zû ne hatin. Li Fransayê çavên xwe U kcçikekê (iigerand û ciigot: Çawa be jî ne xem e, kor be, seqet be, pîr fl bêdu-an be... tenê wî bîne ser navê xwc ku paporteke Europî tînsta bêrika xwc. Û bi bêviya vê bcsretê jî, ber heftc

du caran "loto" dilci^and û ciigot: Keçik bene ku bi perên zêde merivan tînin ser navê xwc. Vê rewşê tenêtiya Mircan kûrtir dikir. Lê herweha jî gotinên penaberan U ser ûştê xewlebûna wî zêdc (Ukir. Mircan cU çavên wan de tcfsîrên rcngoreng dixwend, lê şopa dûvikên ku Artîxil pê ve dikir, (U sitiriyên awirên hemîyan de xuya bûn. Wî xwe bi xwe (Ugot: "Ji se(U sed Artîxil, cz (U çav vîetnamî û laosiyên de kirime yekî bulgarî. Lê tew cw yên polonî, nexasim ew yê bi navê Xirpofskî, ez: ez sorê sor bûm. Di çavê Emîn de jî belbet ez kirime nasyonalîstekî hiştari! Tenêma Wawîko, ew yê ku Artîxil -di gel he-wildana xwe pê re- nikare wî bîne ser riya xwc. Ew jî ji ber acizbûna Wawfto bi xwe, ji tirkan fl dûrketina wî ya ji ArtîxU bû. Lê Wawîko jî jê re bi awakî din bfl bû şcr. Ncma êdî ne rêzgirtina wî jê re weke berê bû, fl ne jî gotinên wî bi tîm bûn. Di gel ku tu carî Mircan hêviyên wî di çavên wî de ne diqurmiçandin. Tenê di nava xwe de carina U ser wî digot: "Wawîkek e û berateke Europî jê re bûye hesret, çi hêvî ê tê de hebe!"

Rojekê Madam Laplasa

midûrc U deriyê dibistanê xist û

bi keçekc 25-27 sale, porzer û keyjal rc dcrbasî hundir bû:

"Nas bikin! Madam Karniyan, navê wê yê pêşîn, Brîcêt c."

got, destê xwe ber bi aliyê keçikê ve kir û domand: "Ji îro fl pêve ew ê weke xebatçiya alikariya sosyal bi we re kar bUce.

Ciyê karê wê U kêleka îdarê ye. Ji we berkes ê pusa kar, staj,

jiyana xwe ya dahatû U Fransayê ji wê re bibêje û bi wê re ça-

reyan bibîne. Weke ku hûn jî dizanin -gotinên xwe berdewam kir- ev nêzflcî çar mehên we ne ku U vir cUqedin. Hûn hinekî fêrî ziman jî bûn ku êdî li ser tedbîra jiyana xwe ya dahatûya U Frnansayê bifikirin. Hersal van çaxan karûkuşîş bi awajî ra-  
47

dibe. Îsal jîşansê we ev madama ciwan ket..."

Mircan carekê tenê serê xwe hejand fl wî û Brîcêtê U hev nerîn. Lê pêre pêre nerîna xwe ji ser guhert. Çavên wî xweber du sê caran kutkutîn. Çavên Brîcêtê yên dindoqî, kerimî fl weke yên pisîkan awirtûj bûn. Mircan wê çaxê (U dUê xwe de got: "Ku hundir tarî bûya, ew ê şewq jê biçîiya!" Kortikên çavê wî jî çermekî bê ruh, wekc yên qalimvexurê giyayê kêfê bû.

Gava çavên wan bi hev ket, mîna ku tişteki tûj (U çavên Mu-can de rabe, wî nikari bû çavên xwe têxista çavên wê.

Piştî bîstekê, mîna ku Mircan hemû pakbûna ^yan û hêza xwe têxe çavê xwe fl dîsa lê nerî. Lê weke ku Brîcêt ji berê de bi hunerên çavên xwe biliya be, bişirî û awirên xwe yên tûj hûr kir û di nav mijankan re raserî wî kir.

Çena Brîcêtê dirêj û zirav bû weke çena rovî, lêvên wê sist bûn û meriv digot lêva wê ya jêrîn ê jê de bikeve.

- Min U dosya te nerî. Divê em bi hev re bipeyivin. Li gor dîplomên te, cz bawer im, em ê çareyeke baş bibînin -beriya ku derkevin, berê xwe bi Mircan de kir û got.

Di herdu rojên pêşîn de, piştî hatina Brîcêtê Mu-can du caran xwe kar diku ku here cem. Lê mecal bi dest ne diket.

Roja pêşîn reşê Artîxil U korîdara qatê erdê dît. Roja duduyan Xirpofskî û hevalê xwe î polonî U wir bûn. Hercar jî bi şîin

de vedikişiya û diçû "gera" xwe. Sibehekê, gava Mircan weke her roj Wawflco ji xew rakir, Wawîko çavên xwe yên zexel bi mizgînî fîrand, di bin simbêlan re keniya û weke ku qerfekê bike, got: "Do êvarê Artîxil çû Parîsê!" Bi bUîstina vê bevokê, dêmê Mircan bfl weke gilopeke lampa ku tu vêxî û vemirînî.

Şewqa şabûnê û sarbûna pêkenînê di wî de gêhîştin bev. Şewqa şabûnê û sarbûna pêkenînê tevayiyê rojê tê de vêdîketin û vedimirîn. Tîn fl seqemê, agir û cemedê ew hUdihanî û dadihanî û cU laşê wî de geh cuda cuda digeriyan û ew dUurîn wekc du perçên germ û sar ku tu wan bi zorê bidî ser hev; geh jî herdu digêhand hev û ew cU bui wan de diheliya. Tevayiyê rojê belawela bû.

Piştî dersê derbasî oda madam Brîcêtê bû, destê xwe î sar dayê û U hemberî wê U ser qîçeqîça nava xwe rûnişt. Çavên 48

dmdoqî fl çena rovî U ber çavên wî, gch diketm heyeta pîrebokekê fl geh jî xifşê xezaleke çavmezin. Beriya ku dest bi pirs û bersivan bikc, madam Brîcêtê hewasa Mircan ya tamsarî bêhn kir. Ji rûniştma wî û bişiran<iina dêmê serbejêr, bi jîrî xwest rewşê biguhere fl got:

- Ev çend roj in ku ez U ben(U tc biim, min texmîn dikir ku ez ê pêşiyê U ser dosya te bixebitun!

Mu-can berê, xwe bi xwc got: "Viya n^ana xwe U ser min danî bû, cz nas kirune fl ji bîra ne kirime!" Diîre bê hemdê xwe germ û sar tev U hev kir, bi fransiya xwe ya qels xwest gotinên qelew bikc:

- Xêra dawîn bêtu- e!

Brîcêt bi şewq fûriya:

- Çi, çi?... got, serê xwe bi delalî hejand û keniya, weke ku mebesta gotmê U gor dilê wêhati be gotin. Lê xwest ku çepi-sandin fl kûrbûna wê derxe.

Mircan xwe xurciland û tîna mebesta xwe, bi awirên xwe bi guhertina gotinê xurtir kir:

- Min got, xêr di dawiyê de ye!

Weke ku Brîcêtê ji xwe re U sîrkê numereyeke bêhawe dîtî be, bi hîkehîk keniya û destên xwe U hev xist.

- Bravo, bravo!... min bawer ne dikir ku ez ê di nava penaberan de yekî wekî te jîr û henekçî bibînim!...

- Tu hînê van gotinên dumaneyî jî bûyî?... Ev çend roj in ku ez U vir im, hîna fena îro ji dU ne keniyame!

Mircan bi rcwşeke sarûgermî keniya, lê bi xwe re kete gumanên sar û xwe bi xwe got: "Vêya ji deqeya pêşîn de ez kirim henekçî, lê ez ê bi vî mirûz û zimanê xwe yê qels henekan jê re ji kuderê bînim." Lê hîsên wî yên bi tîn, di ciU de tev rabûn û di dilê xwe de got: "Ev ya ha, U vir hîna kesekî hespê wê av ne daye! Ew kewujiye û U bemana ye!... Ma ne wê bi xwe got: Min texmîn dikir ku tu ê yê pêşîn bî ku!... Ma wê ê ji van gur û wawîkan kî kiri be serê xwe? Mebeqek keçikê dosya min xwendiyê fl ji nav giştikan ez di çav xwe rc kirimc..."

Mircan mijûl û gumanên xwe cU ser hev re qulupancUn û awirtûjiya tî û buçiyên mêkewan bera ser sîngûberê Brîcêtê

49

da û bêcU bê(U nerîna xwc şêrîn kir û bir ser qUika tazî fl U ser

lêvên sist çavên xwc bîstekê gjrt. Di wê gavê de Brîcêtê jî bi diziya awirên tirsonek hesiya fl hewesa Mircan peland. Lê piçekî xwe ji ber masê bi şûn de da û binekî xwe U ber tîrên awiran sist kir. Lê mîna bibêje: "Pele neke, em U daîrê ne!" Berstika ^ligê xwc yê ku beta qurmê pêsîran vekiri bii, piçekî bi ser hev dc banî, destê xwe U bişkovan peland, lê nexwest wan bigire. Bi kişandina bêhneke piçiik:

- Baş c, got fl ji nava kaxizên pêşiya xwe yek kişand, da ber xwe û bcrdewam kir. Beriya hertiştî em ê vê kaxezê dagirên. Na... bi rastî jî min ji bîr kir ji te re bibêjim ku cUvê ez beriya seet şeşan U nexweşxanê bim. Soza min ji nexweşekî me re heye!.. Ku em îro negêhîjin axaftina xwe biqedînin, em ê sibê tamam bikin.

Mirc:an matmayî pirsî:

- Çi, nexweş?

- Mitîne Mîchel, ma tu wî nas nakî? Ew xortê ^rs î sempatîk berê di foyê de dijiya.

Mircan bi van pesnan navê xo< tekî fransî ji Wawîko bihîsti bfl. Ê bihîsti bû jî ku ew yê dîn carina li pêşiya foyê bi kûçikê mamosta ziman re ciilîst. Digot: "Kflçik pozê wî dalast û wî jî yê kflçik! Ê ji xeysetên vî dîn î ku bi navê Mîchel jî bihîsti bû ku her merivekî dibîne, (nas be, nenas be) lê radiweste, silav dike û heta meriv dev jê bernede ew ji ciyê xwe nameşe!" Lê Mircan bi xwe deqa deqa raserî wî ne hati bû. Mircan mat-majî pirsî:

- Ma te kengî ew nas kir? Tenê cv çend roj in ku tu li vir î.

Brîcêtê bi ken got:

- Ev karê min e! Li Fransayê alflcariya sosyaU baqilan, dî-



nan, betalan û penaberan teva dixê bin baskê xwe. Em jiyânê bi wan şêrîn dikan.

Brîcêtê gotina xwe ya dawîn bi lczet got, weke ku maneye-ke taybetî têxe nav, "em ê U ber çavên te jî şêrîn bikin!" û bi vw zarî jî pêşniyar kir:

- Ma tu bi min re nayê? Ez ê bi trompêla xwe herime cem!... Ku ew ji rûniştvanên foyê yekî bibîne, ew ê gelekî kêfa 50

wî were. Gava ku Mucan gotina "trompêla xwe" bûst, xwe bi xwe got: "Jinik pelc nake, lê dizane kuclcrê çi ye?!..." Serê xwc bejand:

-Erê!

Dema ku Brîcêtê kaxeza Mircan da(Ugirt, bi her pirseke xwe rc pozek diki^and fl gotina pusa xwe (U nav melaqî û şela hiya xwe ya mê de (Ukir... Piştî ki kaxez xelas kir, bi destê xwe î sist pênfls dirêjî Mucan kir fl U lêvên wî nerî:

- Vir îmze bUce, got û awu-ên xwc ji lêvên wî qut ne kir.

Mircan bcrê U paş xwc nerî, xweziya xwe ya weke şîrêzê daqiUtand fl hêdî bêdî dcstê xwc cU ser dcstê wê re bir û pê-nûs bi awakî seksî cU nav tUiyên wê re bir û banî, û... îmze kir.

Dilê Mircan di gerzela sîngê de bUperUcî û bi şabûneke matmajî mîna çûkê baskokirî ku tu deriyê gerzelê jê re vekî laşê vn sivik bû, azad bû, lê baskê şikestî ew bi bayê azadiyê ne dixist, bilnedigirt fl bilind ne dikir.

Wexta bi Brîcêtê re li tromplê siwar hat, serê wî cU ber wî de bû. "Gelo ev biyaniyên har ê çi bibêjin? Ma ew ê çi bibêjin? Ew ê bibêjin, gava pisik ne U mal e, mişk mabcwevan e!

Wa!... Tu bi Xwedê dikî, ma li ruyê dunyayê ji min pîstir kes heye? Ma ji min bênamûstir kesek heye? Ku ez ne pîs bûyama, ez ê ji zfl de U teniştta Brîcêtê siwar bUiatama û dibe ku pêwendiyên me jî ji nuha jî gelek baştir û xurtir ba. Dilê tirso- nek bi sîngên gewr şa nabe! Lê ahd û wahd be U ber Xwedê ku ew bênamûsê şinik xwe têxe riya min, cz ê lêxim... Ez ê çavên wî birijînim. Dunya çi ye? Dunya bîstikên jiyana serbilindiyê ye. Bênamûsî û sernizmî ne jiyana e!"

Gava trompêl hêdî hêdî di pêşiya foyê re digindirî, Mircan di nava mij û dûmana ramanên xwe de bfl fl ji nişka ve gurmîniya defê ji dUê wî bat. Çavcn wî bi wê keçika biçûk "çêlika însanan" ket û te ê bigota ji pêlên awirên mindalî û bi kîn, çemek kete pêşiya trompêlê û herikandina wê gran kir. Di tirompêlê de Mircan ji cara pçşîn bêtir nêzîkî wê bû û rewîştên dêmên wê yên nişmî di hişê xwe de civand. Wêneyekî ji van wêneyên boriyên biçûk ycn ku di ser serê Hz. îsa re sîngvekirî û bi bask... Brîcêt bi cêritî jî ne dihat fesalê.

51

Dema ku trompêl di wir re derbas bû, Mircan bişirandineke mirî hanî ser dêmê xwe, sar û bêgiyan di ber re derbas bû. Piştî ku piçekî jê diirketin, hinekî xwe xurciland û <ii neynika pêşiya trompêlê re lê nerî. Keçikê mûyek jîji halê rawestina xwe ne guherand. Di ciyê xwe de hişk bû bû û çavên wê bi trompêlê ve man. Di neynikê de ji Mircan re hat sewirandin ku keçikê destê xwe bi kulmikî jê re biUnd kir:

- Ma tu wê nas dikî? Ji nişka ve Brîcêtê dengê xwe kir, çen û çavên roviyane di neynikê re hatin ber çavên Mircan.

Mircan bi awakî nebawer:

- Na, got û gotin zivirand. Dibe ku wê ez şibandim hinekan.

Çavên roviyane U dora babetê çîrvîtik berdan, serê xwe di neynikê de hejand û got:

- Dibe ku tu naxwazî ji min re bibêjî.

Mircan keniya û bê deng destê xwe di paş kursiya wê re bir ser qevdeke porê keyjalî û U wir hişt.

- Atansiyon! Em di nav bajêr de ne. Tu wusa dikî ku em birîndar biçin nexweşxanê.

Nexweşxane li derveyî bajêr bû. Gava ku ji bajêr derketin, Mircan bi destê Brîcêtê yên li ser vîtêsê girt û bi hejandin got:

- Ma tu naxwazî ez hinekî bajom?

Brîcêtê bi kenê xwe re mîna bawerî kir ku bi rastî jî mebesta Mircan hajotina trompêlê be, hajotina xwe giran kir ii hêdîka li kêleka rê rawestiya.

Dema trompêl rawestiya, destê Mircan yê çepê di nav por re gêhîşti bû ser guharê wê. Brîcêtê çavên xwe yên bêgîyan meliil kir û bi dengê nizm got:

- Were ciyê min, tu bajo.

Mircan xwe ber bi wê kir, heta kaboka wî ya Ungê rastê ketê binê hêta wê ya qalind û nîvziviradî, wek ku bixwaze ricifina di nava xwe de sist bike, bi herdu destan dêmê wê hanî hev û serê wê hêdika hejand:

- Xwedê tu ji min re ji kuderê anî! got û bi van gotinên xwe re devê xwe gîhand hinariikên wê û daket lêvan.

52

Brîcêtê destekî xwe danî ser hêta Mircan û yê din di nav porê wî re bu- û anî. Dûre devê xwe ji devê wî dûndst.

- Tu tu-sonek î! got fl bi ken berdewam lcir. Hîn cii roja pê-şîn de di nav penaberan de çavê min U te bû, lê tu di ser min de ne dihatî. Ez li vir tenê me. Gelekî nerihet dibim. Di foyê de merivên baqil dîn dibin. A ez jî weha... heta niha we çawa ev wexta qedand!

Gotina ku «tirsonek î» lerzeke sar bi Mircan xist, ricifina wî lê zêde kir û mûyên laşê wî rabûn. Gava Brîcêt dipeyivî, ew xwe bi xwe difikirî û ditirsiya ku tiştek bi wî re demekeve. Di nav diranên xwe yên rikrikî re pirsî û got:

- Brîcêt! Ev hundirê trompêla te çiqas sar e! Ma şofaca te tune ye?

Brîcêt kenîya, dûre bi herdu destê xwe destên wî dan ser hinarûkên xwe û guvaşt:

- Rebeno, te sar e! Ma ev çend roj in ku tu U ber sermayê ye? Te çawa deh sal di nav berfa Bulgaristanê de qedand? Bi rastî jî... ma tu dizanî bê ji Babilonê re dibêjin çi?

-Na!

- Dibêjin, «Sibîrya Fransayê!» Te hîna sar û sermayên vir ne dîtiye... Bayên wusa radibin ku carina xaniyan jî li ber xwe dibin!

Di gel ku Brîcêtê gotin hinekî guherand, lê bi gotina «serma Bulgaristanê» xwe li hilmeke din girt. Bi wê gotinê re jî neqrîskê li nava Mircan xist. Ji alîkî ve wî xwe lomand ku keçeke weke agir di nav lepê wî de ye û ew hîn jî jê re dibêje min sar e; ji alîkî ve jî ramanên wî U eksê xistin. «Di nav berfa

Bulgarîstanê de ez dilgerm bûm û niba jî U ser sîngûberê te sar û sermayê girtiye ser laşê min!» Lê wî fabm jî kir ku wext ne ew wexta ye ku qajişê bi wê re bikêşe. Destê xwe yê çepê di binçengê wê re kir, xwe bi şûn de da, ew bi ser xwe de bi şûn de U ser kêlekê qeliband. Destekî xwe kire nav pê}dlên wê, serê xwe xiste nav û destê xwe yê din cU ser navikê re, du bin doxînê re ber bi jêr bir. Brîcêtê berê çîpên xwe hinekî dan hev, lê dûre heta ku jê hat çîpên xwe ji hev kir û bi destê xwe yê ku keti bû bin wê, alîkariya wî ku- ku bişkoka veke. Ê di 53

wî ciyê teng de, xwe mîna marekî U hev cUgerand û bi hêta Mirc:an ve ber bi jor cUçfl.

Laşê Brîcêtê sist fl nerm bû. Çiqas ku Mirc:an ew cU nav le-pê xwe de dida ser bev, ew biçûk <iibû û (Ubû weke kiUorekê. Lê serê wê kulorê ne cUtebitî. Xwe (iirêjî «çîikê» nav lingên Mircan dikir. Her ku Mu-can serê wê bilind dikir û devê xwe dixiste devê wê, wê serê xwe ji kulorê dirêjî «çûkê» wî dikir. Ê ji nişka ve wêneyê ArtîxU bi hemû hovîtî û liîştarîtiya xwe ve hate ber çavên Mircan: «Tu bi eva imperyaU re çi dikî, ha!» Laşê wî sist bû û xwe hinekî ji Brîcêtê vekîşand. Gava ku Brîcêtê bi awakî hişk pîpikên çavên xwe bera ser pîpikên wî yên (U xewnê de da, bi intîn U qûn rîinişt, heta ku jê hat destê xwe U ^dona trompêlê xist û :

- Mêrd(\*)! got û ev peyvika hişk ji nav diranên xwe yên zingarî dendst.

Mircan serê xwe bera ber xwe da fl gotin ji devê wî derneket. Piştî gavekê Brîcêtê bi qerf di ber re havêt û got:

- Tu nexweş î, ez ê te U cem Michel bihêlim!

Li cem Michel gelekî (Urêj ne kirin. Brîcêtê berê jê re hi-nek hflr-mûr kirî bû. Gava ku kîsê hûr-miiran da dest, kîsekî kaxezîn ji nav dendst, bUind kir:

- Ev sêvên ha, Mircan ji te re kirîne, bi bişuîn got, U Michel nerî, dûre berê xwe bi Mircan de kir û gotinên xwe yên bi Michel re domand. Lê ew tiştên din, min bi perên te ji te re kirîne, Mîchel!

Dîre kaxezek ji bêrîka xwe dendst û da dest Michel. Mircan di kûraniya baweriyên xwe de qet yeqîn ne fikir ku vê comerdî û marîfeta şox ji Brîcêtê bibihîse û bibîne ku ew sêvên xwe bi navê wî diyariyê Michel bike. Ew U ser vê ciwanikiya wê difikirî, lê dema ku Michel kaxeza hesab ji dest wê girt, bi kawik û kûranî lê nerî, «bazirganiya îsmajîlê dîn» hate bîra \w û cU pey re jî lerzekê bi laşê wî girt. «Hema ev qehpika U (\*) Bi fransîye. Sixêfek e ku di demên acizbûnê de, bi mana "pîs,gfi' têtgotin.

54

ber Michel dawa min U ser serê min negerîne... sirên ku têkevine devên dînan, cUbin sosu-met!» Lê te digot qeyê Brîcêtê jî wusa dûrtir dinerî.

Michel jî şetekî entîke bû. Ji van yên ku destên merivan ji wan nabe. Ken û henek ji ber deverên wî cUbarî. Ji bUî çavên wî yên bi mij û dûman, weke yên masiyan, yan jî hertim girover û vekirî, bêhna tişteki şetbûnê jê ne dihat. Wî çêjiya «sêvên Mircan» jî bîr ne fikir û her serî bistekê U Mucan ciinerî û digot: «Mercî, tu hevalê min î!» û diire jî vediniciqî. Carina

destê xwe li çoga xwe dixist û bi îngilîzî cUgot: «YES!»

Du sê caran Brîcêtê bi qerfijê re got:

- Navê wî Mircan e, ne «Yes» e.

Lê deng ne diçûn çavên bi dûman. Wî her weke xwe digot:

«Oh!... yes!»

Di vegeerê de çavên Mircan sist û serê wî ^an bû bû fl ji ber dernediket. Nema destê xwe di paş kursiyê re davêt porê keyjalî. Tîreke sincirandî, weke ş^ke sor cUlê vn dikew^rand û serma hewasê baskokirî ew hUdihanî û dadihanî. Di ciyê xwe de merisî, serê xwe xiste bin baskê xwe û deng jê ne hat. «Ax, mêrd! Tu ne zilam î! Rebeno!... Te sar e!... Tu nema bi sîngên gewran şa <iibî, belengazo, tu êdî pûç bûjî! Bayê sar bi te ketiye... Dewla te nema avê digu-e, kawiko!... Ez nexweş im, bi Xwedê ez nexweş im! Ax!... xweziya min bi nexweşiya Michel! Xwea ez bi wê nexweşiyê biketama û tu carî jî rihet nebûyama! Tenê min ev pêkenîna bi mêraniya xwe nebi-hîsta û neketama vê rewşê!»

Brîcêt jî mest bû bû, lê ne ji hizirandina daxdana pozê

Mircan. Çena li ser «hêlînên çûkan» mezin bû bû, şerm û fedînas ne diku. Wexta hatin U wî ciyê ku di hatinê de lê rawestiya bûn, vegeeriya ser Mircan û gotê:

- Ez, te li vir daynim, yan te bibim cem hevala te ya biçûk?

Tu fêrî wê bûyî?! Di nav kenekî qehpikî re çipîsk U bêvila daxdayî xist.

Mircan carekê tenê serê xwe weha ber bi wê rakir û dîsa vegeerand bin baskê xwe. Ne dizanî bû bUcene û ne jî bigirî.

Mircanê hewasbelqitî, bi tûk tifla pêkenînê; ji bemû pirti-

ka xwe rewisandî dimerisî û hêcU hêcU ji xeysiyetên xwe riit dibû... Weke tUîrê ku bêbask û bênikU bimîne. Tebayê bê lep û qfl... Lê jiyân! Ev şêrînbûna ku bi mflyonan salan cU hiş û (Ulan de meyaye, tUûrê bêgane jî hîn dike pirikandina ber mişkan û şêrê bê lep û qfl jî lîstika simbêlan... fl însanê ku di jiyânê de bê çav be, bê ling û bê pê be, bê cî û war be, bê ehl û cîran be, bê heval û hogir be... ku bê sebr û hedan be jî, tenê giyanek cU laş de bigere, tu carî destê wî ji jiyânê nabe. Mircanê çerirf bi bizmarên nava xwe vegeriya gerzela parsûyên xwe û di nav koma mijûlên tûj weke agu de bê hedan arîya... «Cîran berî war, hespa kihêl berî siwar û mirad nabm bi xwestokên nîvçe û taromar.» Lê ne ciwaser, ne war, ne xwestokên jiyânê... Rê û rêwanî ji wan re U ber çavên wî çênedibûn. Wext bi rewşa xwe ya seqemî geriya fl di çavên Mircan de weke risasê giran û sar.

Brîcêtê her roj penaberek U trompêla xwe siwar dUcir û bi wan re diçû ser «karê wan», yan jî U karê xwe digeriya. Pêşiyê yeko yeko bû, lê dûre U ser cotekî rawestiya... Wê, Wawîko û Xirpofskî bi hev re siwar dUcir... Artîxil jî ji Parîsê vegeriya û bi hatina wî re «amblêmeke şoreşgerî» nû U ser deriyê wî xuya bû.

Piştî çendekî bi lêxistineke nezan, dengê tembîirê ji oda wan dihat, reyandina gurê Manco bi sitrana kurdî «Herine Pêş» dibû. Rewisandm bi quloçê bizma piyoş U dar bû. Mar-maroka Fatîma ji Mircan madgiran bû. Roj bi roj zimanê penaberan bi fransî dirêj dibûn, lê dêmên wan diçûmisîn û ronahî di çavên wan de ne dima. Bêçaretî, biyanîtî, betaU fl



hejartiyê weke kuhneke qijnik girti bû ser çavên wan û mijank jî ji ber ne difditîn. Hedana wan keti bû pelûleke herî mezin.

Foye bû bû weke garana tebayên har, kor û birîndar. Bi hevdu diketin, serê hev dişikandin. Yek nema ku şûna qfl û diranan di laşê wî de reş ne bû be, yan jî wî <ii yekê de gez ne kiri be. Di hemû pevçûn, gezkirin û serêşand de, reyandina gurê har bi ser ya giştan dUcet. Navê wî ji ser zimanan ne diket. Roja ku penaberan nuaş digirtin (ber deh rojan carê 56

300Fr) haritî, hovîtî fl îraeş cU derî fl penceran re dercUket û diglşt erşan. Vexwarina ereqê, êvaran kîn di hişên tarî de cUs-incirand û foye cUbû agirê dogehê.

Mircan di gera xwe de serbest bû bû. Wî tevajiyê bajêr kolan bi kolan, kuçe bi kuçe tev dabû û her dever buhust bi buhust nas kiri bû. U ji bo ku xwe ji ber çavên xelkê bajêr bide aU, ji xwe re ciyên cûrbeciir ki^ kiri bû. Ciyên wî jî U gor teqs fl hewê biin. Ku dunya sayî ba, wî cUda swe riya Troya ku di nava çiya, dehl û zinaran re diçû; ku baran, berf û şilî bûya ew (Uçû dêra Sant Verleta xu-abeya ku U xewlejî bajêr bû. Dêr bi hewş bû. Dîwarê hewşê U hawirdorê gornên kevn (Ugeriya. Bi carekê re şop bi ser ne diket. Riya herdu ciyan jî U rohUatê bajêr ji duryanekê cUçûn. Dema ku mircan dida ser riya çiya û zinaran, dehl û daran, hertim U ser zinarekê bilind kateke dirêj racUwestiya, ba U bin baskên wî dixist fl bi yacUgariya zaroktiya xwe difuiya. Wê çaxê jî hertim sitranek U ser zimanê wî bû. «Xwezî dîsa zar bûma!» Navê wî cijî kiri bfl «Ciyê ku

lê dibine teyr û difirin.» Wê çaxa ku (Uçû dêrê û nava goristanê, pirî caran di qozîyeke şevreş de rû<iinişt. Yan jî ku baran ne bi zirpîn bûya, dikete bin quba gorneke ku şUdê wê weke holikekê... ji her alijî de vekirî bû. Lê çî (U dêrê de, çî cU binê quba gornê de, U vî ciyî her U ser jiyana xwe ya dahatû U Fransayê difikirî.

Sibehekê, gava ku bizina piyoş weke hercar bi derengî derbasî dersxanê bû, tev du kûçUcên xwe, U gor xwiye xwe bi lez got:

- Pirtûkên xwe bi^rin.

ArtîxU ji ciyê xwe çeng bû, li seeta xwe nerî û bi hêrs pirsî:

- Seet çend e, madam? Karê te <ii çendan de dest pê dUce?

Madam wusa bû mîna ku tu şivekê U nava çavên wê birinî.

Di ciyê xwe de hişk, reş û şîn bû, te digot qey qoUncan ew

gjrt. Dûre jî heya ku jê hat, ji nişka ve destê xwe U masa pê-

şiya xwe xist:

- Tito! got û bi ser kûçikê xwe de rabû, kûçikê ku herdu

pençên xwe dadihanîn ser masa pêşiya wê.

Lê Artîxil da ser pişta wê fl bi serlişkî ji binê hedana xwe

57

ya liişk dendst û got:

- Ez bi te re <iipejivim, ne bi Tito re!

Ji derveyî xwiye xwe î bi xwendekaran re bi ncrmî hatê:

- Misyo ArtîxU! Ku tu ne razî yî, tu çima U vir majî? Tu U

vir çî (Ukî? Kê bi destê te girtiye? got fl pir bi aramî xeber da.

Wusa ku te ê bigota însaneke din e û ne Janêta betikî ye. Wê

çaxê hemû penaberan gubên xwe miç kirin. Mu-can jî (U dUê

xwe de got: «Xwedê ji min re U bev anî. Ez ê niha dUê xwe U vê bêbavê rihat bikim fl naxoşiya cU navbera xwe fl Artûdl de rakim. Ku ew sîxur be jî, kelemên wî ê ji pêşiya min kêmbin, û ku bi rastî jî ehmeq fl satore be, ew ê jê re bibe derseke hêja.»

Mircan devê xwe nişt kir ku bi piştgiriya ArtîxU dakeve qadê, lê Artîxil xwe ne girt. Bi lojika xwe berê xwe da şu-ovekirinê:

- Na!... tu U ser pişta me miaşê xwe ji OFPRAYê ciistînî!  
Em dizanin!... lê çima pirtûkên hemû penaberan tune?

Bi

vê

şirovekirinê,

te

ê

bigota

mamosta

ziman

rengê

ehmeqiya ArtîxU ji zû de têngêh<sup>ti</sup> bfl. Wê yekser rişma Artîx-U berda û ji şer daket gilî û gazinan:

- Na, mebesta min ew e ku hûn baştir hînê zimanê fransî bibim, got û mîna ku tew tişteke ne bû be, bi xweşî ji qadê derket.

Penaberên guhmiç man hejirî, ne tişteke ji gurbûnê û ne jî ji vemirînê fêmkirin. Yê ku weke Mircan keysa xwe U peyvê xweş kiri bûn, nola ku tu aveke sar <ii ser wan de bUcî. Ne kesek gêhîşt agir dade û ne jî serê problemên xwe U ser bikizirî-

ne. Ev bevperUcîna wan weke tava baranekc havînê bi zirpîn dest pê kir û bi lez şopa xwe U erdê wenda kir.

Tavên havînê bi dû hevdu de hatm. Lê nema tu heyr bi yekî re çêkirin. Tevayiyê penaberan mîna ku deng û bahsên av û hewayê ji radiyo û televiziyonê bihîsti bin, bizani bm ew ê tava havînê çawa dest pê bike û şopa wê ê çawa hUê!

Necidfljûna Artîxil, hêrsên wî yên vala ji hemûyan ve xuya bû. Hemûyan jî kefa pûç ya pêlên deryayê cUtin fl çavên wan danegirt. Giştan jî fêh kirin piştî ku ji Parîsê ve geriyaye ev  
58

zu-zîtiya wî ya bi mamoste re xurt bflye. Lê hemû kesan fêh ne dikir bê çima bizma piyoş newq jê vala dikir.

Piştî tava havînê, carina dengê ArtîxU bi tirkî dihat, ji Emîn re ûştên şerê xwe tefsîr dikir: «Devrimcî... Türkiye... Fransa... ayni, emperyalizm mucadele dewrimci ayni!»  
Rojekê piştî tava sivik ya havînê, (U dersxanê de ê(U serê Mu-can gêj, sincirî û çelqiya bû. Di wê rojê de jî nameyek ji hevala xwe ya Lûsayê girti bû. Hevala wî tê de lome (Ukir û digot: <Ji dema ku tu ji vir çûyî, ji biU nameyeke xwe te ji min re ne şandiye. Ev bû nama min ya pêncan ku ez ji te rc dişînim. Lê ez dizanim ku ev nama min jî wê bê bersiv bimîne!  
Wê rojê U derve bayekî sar û xurt, weke bayê xezebê dihat. Ev cara pêşîn bû Mircan bawer dikir ku bi rastî jî dirûvê Sibîryayê bi serma Babilonê dikeve. Ba, gulolîkên berfa weke lep, li hev dizîzikand. Merivan nikari bû ji ber çavên xwe vekira û ber xwe bidîta.

Gava ku Mircan wê rojê weke hercar derket gera xwe, bî-

steke dirêj U ber derî rawestiya. Vizeviza bajî ji hundir de derî li ber dihejand. Berf U derve U ber bayî radi bû, cUbû weke pêlên deryayeke çelqyayî, erd û ezman ji ber ki^ ne dibû.

Bêyî ku Mucan li dora xwe binere, berstuka sakoyê xwe ber bi jor bilind kir, bi heyman lê bi heybet û bi herdu destan çengalê derî vekir. Lê ba ew zîzikand. Bi dengekî bUiîstî xwe bi xwe: «Wexta gerê ye!» got û serê xwe î sincirancU dendste derve. Berstuka wî xweber qulipî û weke yekî ku ruh pê ne şêrîn be û xwe bavêje nava şer, berê sînga xwe vekir û bi hêrs gavên xwe avêtin. Di ber xwe de: «Wext, wexta xezeba baranê ye, katê xwekuştinê ye!» got fl da nav berfê.

Mu-can bû bû wek yekî ku bi cinikan bikeve û serê xwc U cUwaran bbdne, hemû hêza giyanê wî leqiya bfl û hişê vn taro-marô bû bû. Di foyê de bayê kîna çavsoriyê rabû bfl fl serê wî disincirand. Li derve bayê reş, xezeb û koranî bi hev re dixistc çavan.

Şepalên baranê, ba û berfê der û hundir U binê guhên bev dbdstin. Mircan çiqas dbcwest ku çavên xwe têxc pêlên xezebê, lê bê fêde bû. Weke birîna devê şîir di serê wî de vecUbû,  
59

cU nav por re xeteke zirav dihate kişanclin û cU serê wî de perçe perçe dibû. Ew U vî alî û wî aUyê kolanê cUpu-pitî, diket û bi dîwaran ve radibû. Lê wî rêya xwe ji ber kiri bû û bê serî ber bi duriyana xwe ve çû.

Gava ku ji bajêr xewle bû, bahozê ew hUdihanî, dadihanî û dizîzikand. Geh xwe qUûz dikir û geb bi çarpiyan cUçû. Lê ji ser pişta bahozê venelçişiya. «Hey erdê bêgane, jiyana bêna-

mûs! Çavan U xwe veke, lok U ser pişta te ye, lok! Lokê ku ji bayê çavsoriyê hêcbûjî, lok!...»

Çavên xwe veku- û nas ku- ku U duryanê ye. Lê dawiya herdu rêyan jî jê ve ne xuya bû. «Hey bahoza çavsor û serlişk, te duriyana min jî ji dest min girt. Ez ê îcar bi kuderê de herim?!» U mîna ku bixwaze hinekî hilma xwe bîne ber xwe û rewrewka ber çavên xwe kilş bUce. Lê bahozê rê ne dayê, ew hejand, zîzikand, hejand, zîzUcand... Bi kotekî bîsteke kurt herdu Ungên xwe yên weke darên pûç cU berfê de çUcand û serê xwe carekê tenê U ber bahozê bUind kir. Lê vê carê dev lê ne digeriya ku ji xwe bipuse: «Ez herim ciyê teyrê xwe, yan ez herim û têkevim binê quba gorna xwe!» Bahoz U bendî bersiva pirsê bîdeng ne ma, darê bêqurm (U erdê bêgane de li ber xwe bu-. Hejiya, hejiya û bi ser dev ket. Ê mîna ku tu kêrê bi(U ser hustuyê wî, carekê tenê orîneke bêhnfetiskî û lerziyajî tal û dirêj jê çû: «Yaaddêêê!»

Orîna lokê hêc li erd û eziman belav bû û U hawirdorî rewrewka sipî, ya asoyê nêzîk, zûrîniya dengê gur û kûçikan, maramara bizin û mîyan li hawakî cU guh de arîyan. Tariyê xwe bera erdê dida, çend qijalek ji ser darekê fuiyan, kirine qîjeqîj û bi bayî re çûn û vizîna bajî berdewam kir.

Bi qasî çarflcekê deng jê biUya. Dawiya sakoyê wî ji paş ve U ber bajî diçû, geh diquUpî geh bi ser de dUiat û weke baskê teyrê mirî U ba dibû. Berfê digirt ser laşê wî. Serê wî di nav gola xwîna wî ya sor de guan û bêlebat ma bû.

Mircan çavên xwe cU nav xwînê de vekir û dengê diya dUovan di guhê wî de çingiya: «TeyrUcê min!... BUa hişê te U serê te be, lawo!... Teyr bi baskê xwe, teba bi qfl fl diranê xwe, û

Însan bi hiş û aqûê xwe digêhm ya xwe! Rêya xwe nas bUce!...  
60

cîran beriya war, bespa kehêl berî siwar, û mirad nabe bi  
xwestokên nîvçe û taromar!...»  
Serê xwe yê ^ran bi derbên şîir bêdfîca U ber vinna bajî  
rakir, dest û lingên xwe piçekî anîn ber xwe, bi hemd şUbîina  
dêmê xwe peland û hanî ber çavên xwe. Hêsir, xwîn, xwîdan û  
berf tevUhevî bû bû... Lêvên wî ricifîn û kela girî ew hUanî...  
«Dayê... dayê ma ez ê bi kuderê de herim! Dayê ma ez ê ça-  
wa xwe ji nfl ve bigêhînim hemêza te... Yadê, ma çi bi serê me  
hat!?» Weke ku encamê hemû derdên xwe cU dogeşekê de  
gewde bike, rawestiya. «Ma ez gazinan ji kê dUcim? Ax sero-  
kên kurdan!... Xwedê ji we hemfilyan re ncbêle! We hêviya  
min qurmiçand! We ne hişt ez bi miradê xwe şa bibim û ne jî  
hêviya xwe bibînim. We xewnên min jî U min herimandin...  
heta kengî hûn ê weke qertelan û ser beratê me hevdu bicircirînin?!...»  
Hêstiriya cinikan, girî, hêcbîina gêjbûnê, ba û bahozê... ew  
taromaro kiri bû. Hêdî hêdî geh bi çarpiya meşiya, geh rabû  
xwe li ber bahozê qUûz kir, weke ku hat wusa jî bi şûn de vejeriya.  
Gava ku di ser tUmikê re bihurî, bê hemdê xwe U hêla de-  
riyê kesk û mezin nerî, tiştê jê ne xuya bû. Di wê gavê de  
Mirc:an di dUê xwe de got: «Çû, çû... nema ez bi awayê berê  
didim ser wan rêyan!» Tiştê ku ciilê min bbcwaze, ez ê yekser  
bUcim, rêya şeref û serfiraziyê yek e. Ê dîire jî ew gotinên  
Danton, ku di pirtûka hînkirina ziman de pê re derbas bû  
biin, hanî bîra xwe: «Mêranî, dîsa mîranî û tenê bi mêranî  
meriv bi ser dikeve!» Ev gotinên ha, du sê caran bi deng U

xwe vedigerand û hişk gavên xwe davêt. Mîna ku bi serketine-  
kê şa bibe û rêyeke nû U ber duriyana jiyana wî vebibe.

Tebayê çarqat di nav berfê de ma bû û bi zelûlî şewq ji  
pencerên çavên wî cUçû. Gava Mircan bi derencê ve hUdiki-  
şiya, dengê tembûireke bi lêxistineke nezanî sitrana «Herine  
Pêş!» bihîst û weke vingevinga mêşê U ber guhê wî ket. «Ev  
sîxur lawê sîxuran bi tembûra kurcU distirê!... » Weke ku tiş-  
tekî di nava wî de biqetete, bi dengê nizm xwe bi xwe got:  
«Ax... tembûra min... canê min cU nava lepên vî gurî de ye!»

61

Lez bi lez berê xwe da serşoka qat. Xwîna bêvila xwe, qeş-  
mûşkên scrçavê xwe şûşt. Ji biU şeqitanciina eniyê, tu nişanê  
ketina wî ne xuya bfl. Ew jî bi hemd porê xwe bi ser de hanî û  
berê xwe da oda xwe.

Gava mifta xwe cU derî de gerand, dengê intînekê cU nav  
dengê musflca Wawîko re kete guhê wî, xwe bi xwe: «Ez îro  
berî wexta xwe hatime!?!...» got û derî dafand. Bi vekirina de-  
rî re hilmeke giran mîna ku hilma pîsî, araq, giya û cixaran  
tevUiev bû bc, gute serçavê wî. Şewqa lampa ser masê jî,  
pêş^ pê de kiri bû, şewqa wê bi zor huncUr rohnê dikir. Ji  
nişkê ve cU qorziya hundir de çavên wî U komek goştê reş î bi-  
riqandî ket. Mircan

heta demeke du-êj jî behitî ma fl laşê wî

bfl weke hêlkanê, te ê bigota erd di bin de dUerize, çavên wî  
beloq û bêhiş vekirî man. Her ku ber bi komê (Uhat, wêneyê  
goştê reş U ber çavên wî bêtu- zelaal bû. Mîna ku di xewnekê  
de be, bêluş ji xwe re got: «Wey lê, ev sisê ne, lawo!» Çavên



wî didît lê hişê wî ne pê re bû: (Xirpovskî U erdê ramedandî bû, balgeh û betaniyên ku di bin hêta wî ya sitîir de, ew kiri bû weke tîpa «L» bi bermeqlûbî, zik û berzika wî ji erdê bU-ind kiri bûn. Brîc:êt li ser «zUamê» wî rûnişti bû, xwe dabû ser kabokên xwe, bi tîpa «L» ya bermeqlûbî re dirêj bû bû û paşiya wê belbelotanî bîi bû. Waw^o jî, ji paş ve ew hemêz kiri bû.

Sê seriyên bêruh ji nav goştê ku ji şebwetê heUyayî bi aUyê wi de zivirîn, awirên mirî bê mane û matmayî tê dan. Weke ku tu heft xenceran U ser hev lêa, xwîn di laşê wî de heta demeke dirêj rawestiya! Hêdî hê<iî bi lingê xwe yên reheU paşû-pê vekîşiya û derî U dîi xwe girt. Lê beriya ku derkeve dîsa xwe li ber derî keyjaUkir, zîrqîniya deriyê cUwaserên wan hat û pêla hUma meyxweşiyê ji deriyê wan jî fûriya. Mircan serê xwe ranekir, lê reşikê di derî de ji sola wî nas kir, gava gotinên bulgarî: «Şto takoye sUova rêka po tûrêtskî?» bUîst, serê xwe rakir ku xwediye gotinan, Artîxil bi xwe ye. Vecmiqî û dengê reheU dengê bêmane jê derçû: «Hahooo!...» Piştî bîstekê bi nerîneke şê U ArtîxU nerî, weke ker û lalan serê xwe je rc hejand fl bêyî ku bizani bc bi kuderê de here, der-62

ket. Instinkta wî xweber ew kişand gera ku ew hînî wê bû bû. Li derve ba hinekî şikesti bû. Berfeke biir û nerm tenê U ber şewqa lampên kolanê dadihat. Ji biU serma fl seqemê, he-wasê Mircan bi tişteki din mijûl ne cUbû. Gera xwe bir serî, heta ku weke her roj dema razana tebayê mezin hat, serê wî cU ber de xwe gjyand ciyê xwe û di hundirê xwe de hat cûtin.

-VI

Jiyan, ev gotina ku bi mflyonan sal (U dU û hişê însan de meyye fl tu kesî; ne pêxemperan, ne jî feylesofan û zanan... hemû reweştên wê bi nav ne kirine. Sînore xwe yê hişk (U nav hebûn û tunebûnê, sax û miriyan, beden û giyan re dikişîne, guman û baweriyên rengoreng jî bi xwe re cUbe fl tîne... Lê merivên ku jîndar bin û xêza sînore mirin fl mayîne cU liiştê wan de weke rewrewkê be, navên rengoreng têne serê wan; ji wan kesan re, yên ku di jiyanê de kes wan fêhmakin, dibêjin: «Sewsî» yan jî «Şêt û dîn» û ji hinekan re jî; ji wan yên ku «dimrin û radibin» re dibêjin: «FUankeso du dunya dîtiye!» yan jî weke yekî ku ji nav gornê rabû be û jiyan pê tal bû be. Rewşa şetbûn û sewsîbûna Mircan, rewîştên van cenaban giştikan di xwe de gewde fikir û ji bemûyan jî lci^ û cuda bû. Ev ne şetekî cU nav baqilan de bû... Lê çelqiyayekî sewsî bû ku gav û seet bi dev û diranên tebayekî mezin cUhate cûtin. Serê wî hertim xilyajî û di ber de, te ê bigota qirika wî bê hestî, reh û gavên wî yek dijiyanê de û yek di bîreke tarî û şevreşê de ye. Sewsîbûna Mircan wêneyekî xerîb dUianî bîra wî. Wî hertim xwe mîna tilûrekî bêgane didît, bi dêmê însanekî ku ji ber bahozê bireve, bê serî di bîreke xirabe de werbûbe, serê wî gêhî|ti be binê bîrê û li dîwarên wê keti be. Lê nîvruhî, eciqî, pelixî, hestîşikestî, di binê bîrê de ber xwe dibîne û dora xwe nas dike. Xewra binê bîrê bê hawe fueh bû û ava wê nizm bû. Li dora xwe, hestiyên dewaran, beratên pisik, bizin û kûçikan dibîne. Lê ew ji tiştêkî dora xwe jî nerihet nabe, ne ji bêhna beratan, ne ji gemar û pîsiya ku ji wan diherike, ne ji kêzik û gêrikên ku derin û tîn, ne ji kurmê ku U ser

ser, çav û guhên beratsm diçin û tîn... Tirsawî tenê jimar û dûpişkên ku bê hawe mezin bû bûn, hebfl. Gava çav U wan (Uket, mûyên laşê wî radibûn, veciiciniqî, dUerizî û çavên wî be-loqî dibûn. Ê (U jiyane de heta ku şiyar nebûya, xwe neda hev û sê çar caran destê xwe U eniya xwe nexista û negota: «Berde, berde!... wa ye gur, pisik û bizin, herine wan!» wêne ji serê wî demediket û bi xwe şiyar ne cUbû. Carina ji dêvla van gotinan ban dikir û dikire qîreqîr: «Yadêêê!» û U ser dengê xwe wê çaxê şiyar dibii.

Gava Mircan diket kûraniya mijûlên bîra şevreş, weke ku xUmaş dibîi, deng dibihîstin û carina otomatflcî U wan vedigerand. Lê dengê wî U alîkî bû, nerîna wî U alflcî û peyvên wî jî bi awakî din. Mana wî jî cU bîrê de dirêj dUcir, yan lcin dibû, li gor ciyê rûniştî û kesên li dora wî. Hertun jî piştî berdana dûpişk û maran, bi kubnên ku U serê xwe dbdst, yan bi qêrîna «Yadê!» demê wî vedibû, dibat guhertin, mîna ku tu çarşefekê ji ser bidî alî. Nerîn û peyvên wî jî wê çaxê hevdu (Ugirtin. Gava ku Mircan du sê caran di dersxanê de, (U bîrê werdibû û piştî kulman bi ser xwe ve dihat, wê çaxê ken û qerfên mamosta ziman û penaberan bi xwe dibihîst. Bi xwe re dikete gumanê ku ew ê xwe wenda bike; tu tama dersê (U bin zimanê wî de ne ma. Xemsar jî ket ku ev wendabûna wî ê jê re bibe sedem ku foyê berde.

Di wê demê de kaxezên wî yên penaberiye bi bersiveke pozîtiv hatin û riiniştina xwe ya deh salan U Fransayê sitend. Mircan wê çaxê ji xwe re got: <Ji vê munasebetê çêtir tune.

Ez qevdek gul bikirim, ji midûra xwe ya borî re diyarî bikim û jê bbcwazim ku bila ew min ji dersê mîaf bike!» û wilo jî ku.

Gava Mircan tev gulan derbasî oda midûrê bû, dît ku Brîcêt jî U wir e. SUava xwe kir û destê xwe da midûrê tenê.

- Ev gulên ha ji we re ne, bi munasebeta hatina kaxezên min.

Madam Laplas ji ber rabû, gul ji dest girt û bibişu-în gotê:

- Gelek sipas, misyo Mircan! Ez pir şa bîim ku kaxezên we hatine. Lê ev gul ne hewce bîin. Te çima xwe nerihet kir?

Mircan ne wêrî bû ku U ber Brîcêtê problema xwe ya xewê

64

ji ji midûrê re bi lêv bikira. Lê Brîcêt bi xwe ji wê derê şemitî û derket. Madam Laplasê pirsî:

- Misyo Mircan, mirûsê te gelekî hatiye gubertin. Ma problemên te hene? Bi rastî... got û bi ken berdewam kir: Bi rastî jî min ji Janêtê bûişt ku tu carina (U dersxanê de radizî û xewnan jî dibînî. Ev rast e?! Ma di odê de hinek te nerihet cUkin? Na xwe tu baş ranakevî?

Mircan nerihet bû ku Brîcêtê U ser zimanê wî vir û derew U hev hanî be, yan jî xwesti be ya xwe bi Mircan bike, wek ku ereb dibêjin: «Li min xist, girîya û berî min çfl giUya.» Lê mîna U ramanên xwe ne ewle û ji xwe ne bawer be ku bikari be dûrûdirêj bipeyive, kin birî fl got:

- Na, tu problemên min tunene! Di xwendina ziman de ez gelekî diwestim. Ez bi tena serê xwe U ser pirtûk fl kasetên hînkirina ziman dixebitim û bertim dereng ra<iizêm. Loma ez carina di dersxanê de xilmaş dibim. Ku te îmkan hebe, ez dix-

wazim ku tu min ji dersê mîaf bikî. Ji bo axaftin fl zû bînbûna zimanê fransî, ku cî hebe ez dbcwazim di odekê de bi yekî fransî re bijîm.

Piştî hefteyekî Mircan ji xwe re digot: «Duayên rebana diya min qebiil bûne û Xwedê U min hat rihmê!» Ew ji dersê mîaf bû, Brîcêtê jî ber «danûstandina zêde» ji karê wê dûrxistin. Michel jî ji nexweşxanê reviya, hat foyê û dUê Mircan xweş dibû: «Ez ê bi Michel re bijîm, (U vê foyê de ji wî çêtu kes tune!»)

Gava Mircan cara duduyan çfl ba madam Laplasê ji bo jê bbcwaze ku tev Michel di odeyekê de bijî, ji mirêsê wî û rewşa wî ya psikolojîk û xwestokên vn, madam Laplasê yekser fam kir ku ew xwe ji ber bizina xweba wê, tebayên bar û liîştari cU-de alî. Michelê dîn jî pê ve bû bû dirdirik û bi kuderê de biçûya digot: «Ez qebûl nakim ku kes bête oda min ji biU ew yê ha!» (Destê xwe dida porê xwe!) Heger binekan bi qerfî jê re bigota:

«Hemû serreş in, kîjan ji wan?» Micbel digot:

«Xwediyê sêvan, oh yes!.. yes!»

Piştî çend rojan Mircan û Michel ketin odeyekê. Oda wan U ser qata duduyan bû. Hîrehîr û qîreqîra qatê yekem ji guhê

65

Mircan dîrket. Êdî nema bi ro cU bîrê werdibfl. Lê cUwaserên wî yên nû, kesên ku bi deh û bîst salan di nav diranên tebayên mezin de hati bîin cûtin: Karkerên Maxreb, Cezajîr fl Tûnisê bûn. Hinek ji wan (U tewla xwe de gêj fl binek şemûs bû bûn, lê ji biU zîtikên U hewa tişteki (iin nema ji wan dihat. Gezkiri-

na pidûyên bê diran bû. Evara pêşîn tînisîyekî çavşaş, emrê wî U dora 50-52 salî, dêmê wî weke binareke pelixî, pentelon kesk, îşUg sor û çakêt jî bêşînê vekirî, bê^ ku U derî bbce û si-lavê bUce, bi cnt fl pêt derî vekir û xwc ralcişand Micbel:

- Gû lawê gû! Ez dizanim bê tu çima batiyc ser qata min...

Tu hatiye ku hevala min ji min bîstînî! got û weke bablîsokê U hundir çû û hat.

Tiştên ku Mircan li ber çavên xwe dît, mîna ku U dunyaye-ke din sarî kete nav wan, ew ji hev qetand, lê rê U ber ew î tû-nisî ne dibîi; ne erebî ciizanî bû û ne jî fransiya wî fransiyeke baş bû. Bi zimanê xwe î taybetî têra xwe zirt û sixêf kir: «Tu mêrê çê bî, tu ê pê re bipeyivî!» Bi vê gotina xwe ya dawîn re şîrqînî ji derî hanî fl derket.

Yekî din jî emrê wî U dora çelsalî, ew jî çer ku ji kar dihat, xwe ji ber neynika serşokê ne cUda aU û ber bi dengekî bilind distira: «Eyeretnî bî-seîbî we hewe wîqaro.»(\*)

Yekî din jî cezajîrî bû, jê re (Ugotin «Jina hefsa», heger U ber wî behsa çî bihata kirin: Dizî, peran, bazirganî, pîrekan... Wî hertim wusa dest bi axaftina xwe dikir: <Jina min weba cU-got, jina min weha (iikir!...» û bi dengekî bilind (Ugot: «Hemû jî ji min ne rihet in, ji ber ku jin û zarokên min U welêt hene!» Hemû jî di oda xwe de, yan jî U xwarinxana qatê xwc bi dengekî bilind limêj dikirin fl ber yekî ji xwe re azan cUda. Giştikan jî, U ser çî bi hev re bipejiviyana, gotina wan ya pêşîn « Ya zubî»(\*\*) bû... Roj tune bû ku şer û sbcêf bi hev re nekirana. Bi kurtî: her yek ji wan bi derdekî bû, her yek bi awakî dîn û şêt bû bû...

(\*) Bi erebîye. Bi mana "Porê sipîji min re kire eyb" e.

(\*\*) Bi erebîye.

Gotineke argo û bi mana 'ewkê min" e.

66

Ji hemûyan dUê Mirc:an bi yckî ji wan dişewitî: Emrê wî U dor 45 saU bfl, jê re <iigotin Seydî. Belengazo betal ma bû, miaşê betaUyê cUstend. Jina wî tev çar zorokan bi dû yekî keti bfl. Ew jî ji sibê heta êvarê di xwarinxana qatê xwe de rûcii-nişt, destê wî U ber ruyê wî û ber cUponijî. Her serê kêUyekî (Ugot: «IstaxfîruUab, la-flahc-fleUab!... Xwedêyo tu jê re ne-bêlî!» Karê v/î ber Umêj, nifîr, duakirin bfl.

Gava ku Mircan çav U wî (iiket, ji alflcî ve dUê wî pê ciişewitî û ji aUkî ve jî dUê wî bi jiyana wî xweş dibû. «Qet nebe ez rojê carekê duduyan xwe wenda ciUcim, lê ev belengazê ha ji sibê heta êvarê kurm cU çav, ser û guhên wî de cUçêrm.»

Ji biU van scrpêhatiyan fl «têwerbûna» bîrê ku pirî caran bû bû bi şevê, jiyana Mircan bi Michel re roj bi roj xweştir dibû. Ew û Michel diketin ser xeysetên hev, ji hcv fam dikirin û rewşa wan weke hev cUbû.

Michel xwe(U televizîyon fl teypeke mezin bfl. Miaşê wî U dor çar bezar frankî bfl. Sibehan dema ku racUbû, xwe derman dikir, hembra û bodra (U xwc (Uda û dadiket bajêr. Kolan bi kolan, kuçe bi kuçe <iigeriya fl U ber her deriyekî ku binek U ber hebûya, radiwestiya, ji wan re qala dermanê xwc dUcir, yan jî li gor xwestina wan U ser Ungekî direqisî. Xclkê bajêr, piçûk û mezinan ew nas dikirin, jê hez dikirin û lê dihatin rehmê. Êvaran jî wî televizîyon û teypa xwe bi hev re vedikir, kovara seksê dadihanî ser sînga xwe û xwe radimedand.

Lê wî li hemûjî jî ne dinerî fl guhdarî jî ne dikir. Yekser di xew ve diçû.

Piştî çend rojên jiyana xwe ya bi hev re, ew î tînisî çû ku îc:aza xwe U welatê xwe biqedîne. Bi çûyîna wî re keçeke fran-sî weke birmflekê, diranfirk, fahş fl porê wê di nav çavên wê de, bêjî ku U derî bi^ne hêdîka kete huncUr, tiUya xwe danî ser devê xwe û U Mircan nerî: «Huşşş!» got û U ser pêçiyân, weke ku bere diziyê derbas bfl û U kêleka textê Michel rûnişt. Hêdîka bi hemd li doxîna wî xebitî.

Mircan, pêşiyê geh di bin çavan re lê dinerî û geh pijta xwe pê de dikir. Lê mîna berxeke ku bi guhanê beratekê bi-mije, keçikê jî bi xafiltî «zUamê» Micbel dimêt. Piştî demeke 67

kin, wusa jî bê deng û hêcU ji hundir derket. Beriya ku derî U pey xwe bigu-e, U Mircan nerî, bi gotina «merci» devê xwe bê-deng bir û anî, pê re bişirî.

Ev wêne sê çar caran dihat dubarekirin. Carina Micbel di-kete rewşeke wusa, mîna ku U ber xwe dikeve û fecîî dike. Di demên weha de, çavgirtî balgeha xwe davêt ser Mircan: «Se-rê xwe têxe binî!» digot, lê (Usa bi mirîti di nav lepên keçikê de dihat mêtin. Ev hemî tiştên ha nema ê(U Mircan matmajî dikir. Tenê di dema pêşîn de tiştêkî mûyê wî çîp kirin. Êvare-kê reşê Brîcêtê U foyê dît!? Pêşiyê ji xwe bawer ne kir ku ew wêne rast be. Wusa guman lîcir ku cUsa (U «wendabflna» xwe de dîti be. Lê êvarekê gumanên wî têkçûn û şûna wan bawe-riyeke zelal danî: Li dor seet nehê êvarê ArtîxU û Brî(xt bi hev re U deriyê wî xistin û derbasî hun(Ur bûn.



Gava ku Mircan çav li wan ket, ji nişka ve vecirûqî fl ricifî mîna ku nava wî hemû ji ciyê xwe derkeve û dUê wî ji qefesa sînga wî li pêşiya wî U erdê bikeve...

- Behitî nemîne, em hatine ku dUê te xweş bikin! -çena rovî û çevên tîtikî U kêleka gur bişu-în- Me nameyeke dirêj U ser rewşa jiyana penaberan û pêwencUyên wan û îdarê nivisandiyê. Me hemû nijadperestî û bovîtiya Janetê şirove kiriye û kêsbaziya xwenga wê ya «mulajîm» daye xuyakirin. Divê hemû penaber îmzên xwe bavêjin ser ku em wê ji OFPRA û serokwezîr re bişînin.

Gava ku Brîcêt dipejivî, gurê Manco çav U Mircan dize-wûrand. Mircan berê hêdî hêdî xweziya xwe dadiqurtand û di pey re jî hêrs dibû. Piştî ku Brîcêtê peyva xwe xelas kir, bîsteke dirêj rawestiya, çavekî xwe bi ser yê din de bir fl ji nişka ve birûsk ji ber çavên wî çûn. Mîna gurmîna ku ji tava ewrê reş fl giran bê, ji nava wî bi orînî gotinek derket: Derkevin, derkevin!... Derkevin, derkevin... derkev!...

Bi dengê Mucan re derî û pencere hejiyan. Çavên Brîcêt û Artîxil bel man, weke çavên du nişkên zelûl ku serê wan bi hev re têkeve xefikeke hesinî. Artîxil xweş fam kir ku di vî hundirî de deng bi ser dengê Mircan nakeve. Bi destê Brîcêtê girt, paşîpê bûn û bêdeng derketin.

68

Bi derketina wan re bîstik bi bîstflc, seet bi seet û roj bi roj navê Mirc:an û rewşa jiyana vn di devê rûniştvanên foyê de weke benîştê daran pûç (Ubû. Gotin bi du rengan (iibatin gotin. Mircan jî bi riya karkerên ser qata xwe re (UbUîst: Hine-

kan U ser wî digotin: «Ew şetekî beradayî ye.» û delflên wan jî jiyana wî ya ku bi Micbelê dîn re bfl. Ê hinekan: «Ew ne dî-rokzan e... Ew sîxurê madam Laplasê ye.» û delflê wan jî ew gulên ku wî diyariyê wê kiri bfln, bfl. Di qatê de bemû penaberan dixwestin ji ber bazciin. Mircan jî bîstik bi bîstik, seet bi seet û roj bi roj bi bihîstina van gotinan bêc cU bfl fl «wenda-bûna» wî kêmbû. Lê êcU ne U foyê û ne U bajêr çavên vn U reşikên ArtîxU û Brîcêtê diket.

Hewa roj bi roj xweş dibû û meşa U ser Urgan pê xweştir dibû. Mircan nema diçû gera xwe ya nbcumancU. Duriyana ku diçû; çiya, dêr û mezal ji bîra kir. Hemû gengaziyên jiyana xwe dbdst şeweyê şetan. Gera vw jî pirî caran bi Micbel re û U sûka bajêr bû. Rewşa wî jî bi vî awajî U ber çavên xelkên bajêr kir dibû û dihat naskirinê. Jê re (Ugotin: « Dîne bêgane, hevalê Michel!» Artîxil û Brîcêt jî piştî van gotinan, nema bêhna wan U bajêr dihat; ew nependî bû biin. Xelkê digot: «Brîcêtê, Xirpofskî U kêleka xwe siwar kir, çiin û nema vege-riyan!» U li ser ArtîxU digotin: «Geh bi dizî tê foyê, geh U mala karkerekî tirk, U xewleyî bajêr radizê.»

Carekê di nava bajêr de Mircan û ArtîxU rûberû rastî hev hatin. Mircan hêdî hêdî xwe jê xafil fikir û ber bi wî dihat. Ne dbcwest riya xwe ji ser wî bide aU. Lê Artîxil serê xwe xiste ber xwe, çivek da xwe û bi rehwanî meşiya.

Mirc:an da dû û bi kurdî dengê xwe xweş kir.

- Artîxil! Ez tiştekî bi te nakim, dbcwazim bi te re bipejivim.

Artîxil êvarekê tenê U dû xwe nerî û mîna kûçikê ku hestî di qirikê de bimîne, bi awakî bêhnfetisî kuxuya û di ber re jî

bi frensî got:

- Ez weke te ne dîn im!

Mircan çivê wî lê rast kir û U ber deriyê foyê ew gut. Lê Artîxil mîna nişkê ku ji nav pençên teyr bişemite, bi melomi-69

larî û dijwarî xwe gêhand derencê. Lokê bêc U pêşiya wî xist. Gava ku ji jor de lê nerî, Artûdl rawestiya, berdu destê xwe danî ser serê xwe û çavên xwe gjrtin. Weke ku Mircan xwe ji ser xaniyekî de bavêje xwarê, berdu lingên wîbi çerpîn U gerzela sînga ArtûcU ketin fl orînî bi ArtîxU ket. Herdu bi hev re ketin xwarê. Lokê hêc <ii ser de bû. Ew da ber tep fl pêhnan: «Sîxur lawê sîxuran, tu ê îro ji ber min bi kuderê de herî?» Cara dawîn bi qevdeke porê wî girt, bi qasî bihustekê ji erdê bilind kir û heta ku jê hat ew U erdê, U derencê xist. Laşê ArtûcU bê lebat U erdê dirêj bfl. Mircan bi qasekî xwe bi xwe fikirî: «Gelo ew ê dîsa rabe, yan bi carekê de mir?» Lê encam çî bûya jî, êdî jê re ne girîng bfl. Di ser xwe re nerî, dît ku rûniştvanên foyê yeko yeko serê xwe (U ser derabên kêleka derencê re dirêj kirine û U wan dinerin. Kesî ne diwêrî bû xwe nêzflcî «dîne beradajî» bikira. Dema Mircan bi şeweyê şêtbûnê bi derencê ve hUkişiya, hemûyan xwe ji ber dan aU. Piştî vê bûyerê, Mircan ê<iî ne bi «cinikan» diket, ne jî <ii «bîrê» werdibû. Lê qet ne dibat bîra wî jî ku bikari be ji nû vc xwc vegeîne Mircanê berê.

-VII-

Li bajarê BabUonê bi du sê celebên nav pê keti bû. Hme-

kan jê re digotin: «Dînê porreş», binekan: «Dînê hevalê Michel.»

hinekan

jî

digotin

«Dînê

bêgane.»

Lê

şêtbûn

fl

dînbûna Mircan bi reng û rewşeke taybetî bû. Ew merivekî çelcjayî û wendajî bû. Di civakê de bi tena xwe bû, tev xeUcê bû û nependî bû... tilûrekî ku ji refê xwe ma bû û saxekî bê-  
^yan bû. Loma jî hemû navên ku ciibatin ser wî, xwe U rewşa wî dbcwarin. Şêwe û awayê jiyana wî ya buhurî cU civaka nû de jê re dibû mestere, ne ji kirinên wî re û ne jî ji gotinên wî re. Ew bû bû weke melevanekî westiyajî U pêşiya deryayeke nenas ku ji pêlên wê yên şepal û dijwar çavên wî nebire. Wî xwe U qelsiyê danî bû. Ne U gor hişê xwe, nc U gor hezkirina cUlê xwe, ne jî U gor bîranînên jiyana xwe ya serfîraz û zaroktî gavên xwe davêt. Xwe U pêşiya keftelefta jiyane qulîz dikir, we-  
70

ke xUtekî kor di erdê ber kendalekî avmiçiq de, bi zexeU şîna

xwe

çêkir.

Bayê jiyana

serfîraz

nema

U

bêvila wî dixist.

Berxwedana tamaran sist bii, serê xwe bi arzfl û bê arzû U ber jiyane nizm kir û daxist. Jiyane ew U gor zagonên «şêtbûnê» hemêz kir, hêdî hêdî ew ji per û baskên wî kir, ji mejî û zanebûnê, ji şêrînê û bedewiya kirinên serfîraziyê dûrxist. Tenê carina hişê wî dihate serê wî û bi xwe mijîil cUbû. Wan çaxan jî ji xwe cUpirsî û davêt aqUê xwe yê çelcya jî: «Sewiya xwendina ku min kiriye, cUplomên ku min sitendin, serokê vî bajarî bi xwe jî ne gêliştîyê!» Lê pêrc pêrc jî bi tus û poşmanî li xwe vedigerand:

«Ez ji şerê berxwedana jiyane derketime, êcU mafê min tune ye ku ez xwe dendnim hemberî ciwamêrên qada şer!» Herweha piştî xwe bi daxwaz û îrada xwe dida kendalê miçiqiyê ku bi xwe hîlbijarti bû.

Gumanên ku carina pê re peyda dibûn, bi carekê re ew bêhiş dikir. Geh ji xwe bawer dikir, geh ne dikir. Gumanên bi hişekî şiyar roj bi roj di jiyana wî de kêm cUbûn. Weke peqên ku bi ser avê dikevin û çawa peyda dibin, weha jî zû wenda dibin, ew jî wusa bû. Ne dixwest bi «aqil» bijî, herweha jî dixwest ku hinek rişmekê têxin hustuyê wî ku bi dû xwe de bUdşînin. Bi vî awayî carina ji xwe cUpirsî: «Xwezî pasporteke kûçikan» li vî welatî bidana min! Ma kûçikên wan tev ne bi pasport in? Wî ê(U tamajiyane seh ne dUcir, lê qehremaniya giyanî jî têr ne dikir ku bi xwe xwe bikuje.

Hogirtiya wî ya bi Michel re, di sewiya wendabûna wî de, çareyeke xweristî bû. Pelûlika dawîn bû ku pê ve hUdiki^iya

sewîya jîyanê û raserî hilovka xelkên wê yê «durust» dibû. Gava çend c:aran bi Michel re U ber deriyê dikan û malan digeriya û xelkê ji Michel dixwistin ku ew awayê dîk û hespan bike, wê çaxê Mircan bi çend gavan xwe vedikişand, ji dûr ve li «spektakila» hevalê xwe temaşe dikir; piştî demekê şîşe û dermanên ku ji bêrîkên Michel de dUcetin, berhev dikir. Bi vî awa^ êcU zêde ji hevalê xwe diirnedUcet, U pêşîya wî radiwestiya û weke xelkê wî jî jê re li çepUcan dixist. Lê dawiyê çare nema. Xelkê ji wî jî xwestin ku ew jî tiştê bike û jê re gotin: «Hevalê Michel, ka tu dikarî çi bUcî?» Û ji hevdu jî dipu-sîn û 71

digotm: «Ev dîne bêgane çima alflcariya Michel nake?» «Sêtê bêgane» pêşiyê U ber xwe cUket û tiştê cU hişê wî de ne digeriya. Ji biU hUperikîna «çaçanê» tiştê nizanî bû. Lê carekê ji nav ezûmata ku U wî û Micbel vehewiya bû, U taxeke bajêr, çavên wî bi keçeke 15-16 saU ket. Wê çaxê mîna ku Mircan xwe cU xewnekê de bibîne. Lê ji xwe ne bawer bû ku wî berê ew dîti bfl, yan ne. Dême keçUcê bi wî re bişu-î. - Tu, dîne bêgane, rockê bueqise, rockê!

Ji nişka ve te ê bigota kaniya dUovanî û evîne cU dUê wî de vebû. Heta bîsteke kin jî hişê wî U hev geriya: Erê, ev «çêUka însanan» bi xwe ye, ji mm dbcwaze ku ez kêfa wê bînim. Mucan serê xwe xist ber xwe, lê ramanên wî yê cidcU dom kirin: «Ez bi kêrî tiştê nayê. Tew hilperikandin jî ji min nayê!» û li ber çavên wî weke «tabloyeke bi jîyan» wêneyên hUperUcandinên ku di jîyana xwe de dîti bîin, gewde bûn û sûretên wan U ber hatin vegirtin. HUperikandina Antonio Gades, pîremê-

rên çiyayê Qafqasî... ji hemûyan paybUindî fl hostetiya livan-  
dina piyan hilbijart.

- Tu, tu! Çima tu jîweke Mich',1 nareqisî?

Mirc:an bi zivirandinê, dêmê horiyê û bi bUîstina dengê wê  
yê şêrîn û zelal wusa bû ku weke tu berxekî di ser de şerjêkî,  
ji fediyên sor bû. Ji nişka ve te ê bigota «zarokê ku benê Ungê  
xwe biqetîne» hêdî hêcU ber bi Michel hat, di dUê xwe de:  
«Lo hema ez ê dilê vê horiyê xweş bUcim!» got û bi Michel re  
U ser çepikan hilperikî. Ê xwe di nav «tabloya bi jiyan» de  
dît, ya ku berê di serê wî de digeriya.

Hilperikandina Mircan hêdî hêdî rîtma xwe digirt, gur di-  
bû. Wusa ku te ê bigota tevajiyî merivên dorê U wî temaşe di-  
kin, liveke bê mane ne cUkir. Hemû giranî, kubarî, marffet û  
hostetiya xwe dbdst livandina endamên laşê xwe. Carma sînga  
xwe berz dikir, hilma xwe diçUcand û bi hûrmeşîn radibû ser  
tiliyên xwe. Carina jî destê xwe yê rastê di ser serê xwe re cU-  
kire weke mertal û yê çepê jî weke şûr dibu û dUianî, bi mê-  
ranî dUcişand ber xwe,  
yan jî destê xwe yê  
rastê U

ber

kembera xwe mîna ku bi qevda xençerê bigire, hişk radigirt û  
bi qehremanî serê xwe bilind dikir û bi pêyan reqsekc sivUc û  
72

ciwan dikir. Ew hUnecUperikî bi qeyisu ku cU jçna bîstUcên mê-  
ranî û qehremaniyê de dijiya. Ê cU jiyanê de hinek lîstUc jî he-  
ne ku çiqas sexte fl nejêza bin jî heşmetiya wan bi merivan

xweş e. Mircan ew bîstUca di heşmetiya bişu-îna dêmê «çêlUca însanan» de vedigevizand, şa cUbû û hinek ji wê jiyana xwc ya miçiqî jî temsfl dikir.

Çepik her bi her xurt dibûn, hilperUcandina wî û Micbel zîz dibû. Ezûmat jî U wan hati bû hev û ber bi her zêdc dibfl. Mirc:an c:arina ji nav wan nerîna xwe U ser dêmê «çêUka însanan» radiwestand, hêrs û qewet ji awirên wê cUgirt. Carckê ji nişka ve, çavên wî ji nav ezûmeta ku U wan vehewiya bfl, U çavên zUamekî çavzer ket. Piştî bîstekê ew î çavzer weke (U «tabloyeke bi jiyana» de dîti be fl pê re bi xeyala xwe qise kiri be, sûretê wî U ber çavên Mircan xweş hat vegirtin. Lê Mircan ji ramanên xwe bawer ne kir. Bi Uveke liişk fl awirekî tûj serê xwe ber bi aliyê ew î çavzer de kir û bi luşka dengê wî biUnd bû:

- Na, ev ne Şadî ye! Ka Şadî? Kê ji we ew dîtiye?!

Bi vî dengê Mircan re dengê çepikan xurtu bû fl dengê «çêlika însanan» bilind hate wî:

- Eferim, bêganeyê ciwan! WUo, wUo! Bravo, bravo!..

Mircan hilperUcîna xwe guherand fl kir weke meşa «korrîda»(\*) û bi hişiyarî çavên xwe ji nav ezûmatê U Şadî gerand. Û weke ku di xewnekê de be, dengê U ber guhê wî ket:

- Ya girîng ew e ku tu erebî cUzanî!

Lê wî sînga xwe berz kir û destê xwe bi şirikî bu û anî û U serê çavzer geriya. Lê ji nav çepik, fitefit û qîjewîja zarokan, te ê bigota destekî pan û zivir U defa sîngê wî ket û gurmînî ji nava wî anî. Mircan bi carekê re bû weke ku di «tabloyeke sar û bêjiyan» de rawestiya be. Liva wî sar bû. Lê \w ne ji xwe bawer kir û ne jî ne kir. Ji nav ezûmata xelkê derket û U perê



dora wê sekinî. Bi hişê xwe yê çelcjayî ket gumanên taromar:  
Gotineke bi spanîye û tê mana "meşa ga yê ku di şer de  
(\* )

sînga xweji rimê nade air

73

«Mafê zarokên me jî bene ku zaroktiya xwe bibînin... ma ew zarokên ku bi wan re U botêla Parîsê bûn, kurd bfln?! Ew bi çi zunanî cUpeyvîn?...» Û ji nişka vc zaroktî fl lîstikên wî yên «şer» cU serê v/î dc weke «tabloyeke kevn û bêreng» tev U hev bûn. Û ji wan bîstikên ku cU hişê wî de cUgeriyan, (U bîstikeke kin de bi lome ji xwe re got: «Xwezî dîsa zarok biima! Xwea ez mezin ne bûma! Ku mezinbûna meriv ne cU nav xelkê wî de be, ne bi wan re be, tu carî (Uyar nabe. Û zanebîna bê armanç, wendabûn e. Ax gelo nuha Mecîd û Felît U kuderê ne? Çi (Ukin? Gelo ew, yên mîna min çel(jya^ jî venagerînin ser rê? Berê wan nadin welatên wan? Lê ê(U giU û gazin jî fêde nakin. Çi ê ji dest wan belengazan bê? Ew ê hertim çewtiyan bikin ku şareza û xwedî dîplomên weke min ê ji wan dîrkevin, û weke min dîn bibin!» «Daweta» U dora Mircan û Michel ferikî. Weke hercar dan kêleka hev û vegeyriyan mala xwe.

Bîstikên «hişiyar» roj bi roj di jiyana Mu-can de zêde dibûn. Her car jî cU demên weha de, ji xwe pu-sina dike: <Ji bo ku ez ji vê rewşê derkevUn, divê ez çi bikim? Ez kî me û çi bi serê min hatiye? Ku meriv serê xwe U ber zehemetiyan jiyane nizm bike, pêlên jiyane jî wî ji qurm ve radike û U ber xwe dibê. Merivê ku hazu-ya xwe neke, ku U pêlên wê siwar be, ew

ê U ber tofanê here, U tu erdîşîn nabe û bi durustîjîndar nabe!...» Wî her xwe bi xwe digot: «Min çiqasî xwe ji wan pêlan da aU jî, wan her bê rehm ez avêtim vî aU fl wî aU. Demek ji min re cUvê ku ez bi rê û daxwaza xwe ciyê xwe hilbijêrim. Ji bo vê yekê jî rojekê berî rojekê divê ez ji xwe re pasportekê dendnim, û xwe bigêhînim welêt. Bi vê daxwazê, carekê da kêleka Michel û çûn belediya bajêr, U wir Mucan ji jmeke karmend re:

- Ez dbcwazim ji xwe re pasportekê dendm! got û qerta xwe danî ser masa ber wê.

Karmenda ku ji dêmê Mircan nas dikir, beriya ku U qerta wî binere, bi zarekî qerfane lê vegerand û cU nav kenê xwe re pirsî:

- Tu pasporteke çawa dbcwazî?... Ji bo çûjîna ser hîvê, yan  
74

ji bo gera BabUonê?!

Mircan wê gavê xweş fam kir ku xwe bixejidîne jî fl xwe nerihet jî bikc, tişteki bê sflid e. Wî cU nav kenê xwe yê tamsarkî re lê vegerand:

- Hema yeke çawa ji dest te derbikeve! got û serê xwe bera ber xwe da.

Jinikê bi wê laqirdiyê jî dosyayek danî ber xwe û da^t. Ji nişka ve dîsa bi kenekî bebhebî re:

- Ez profesiona te çi daynim? Ma te (U jiyana xwe de tu kar kiriye? pirsî, kenê xwe hinekî din jî qubetir kir û berde-wam kir: Ma dîplomên te hene?

Mircan bîsteke dirêj rawestiya, sar bû, cemidî û bê ruh ma.

Keleke girî ew bUanî, qu-ika wî hat ^tin fl çavên wî xwe ji ber xwe mişt hêsir bûn: «Bi vî navê şêtbûna ku bi mm ketiye, ku ez jê re bibêjim, cii warê kurdolojiyê de ez doktor im, gelo ew ê bigirî yan ew ê bikene?» Di wê gavê de rewşeke xerîb ku tu carî dijayetiya ken û girî wusa tevUhev ne biine, bi wî ^t. Lê êdî ne ken û ne jî gu-îjê dihat. Bi orîneke şêt qirika wî vebû:

Ez

doktorê

kurdolojiyê

me!

Ez

doktorê

kurdolojiyê

-

me!... Hîin bawer dikin, nakin... bi kêfa we ye!

Bi borebora girî pişta xwe bi wan de kir û derket. Hemû karkerên dajirê serê xwe di ber de ziviran(Un û matmajî bûn. Lê hîna xwe ne gêhandi bû devê derî, dengê hevalê wî Michel kete guhê wî: «We çima hevalê min xejidand? Ew rast doktorê sêxologiyê ye ha!»

Rewşa Mircan ma weke berê. Bi oreor pêlên kela girîyekî nedîtîjê diçû.

75

## MUHRA MUXTÊR

Ji şevên bavîne şeveke sa^ bû, qursa heyvê cU zikê ezmên de weke dêmê keçeke bedew û devUken, şewq û nûr jê cUçfl. Şewqê topraxa gund fl ser bêndera hemû kUş dUcu-. Tc digot

qey bona eşqa dUê wî ev zelaltî, şewq û nûr U csmanê gundê wan giyane hev. SUo, per û baskê wî tune bûn ku bifuiya. Lê kêfa wî tamsarkî bfl, geh bi xwe re dikeniya, geh jî sar ccmidî duna û wehs dUdr... Rê U pêşiya wî vebû... ma ku xwe hazu-bUce fl bi rê bUceve, «Partiyê bi xwe, xwe daye ber!... Lê gelo, partî ê çawa min bigUiîne Bêrûtê?» -Carma ji xwe dipusî fl sar duna. Ev ne pu-sa yekemîn bû ku Silo nikarî bfl bersiva wê bida, lê her ku rê U ber teng dibû fl xeyala wî dihat gu-tm, wî digot: «Ez ê ji çi bitu-sim, partî bi karê xwe dizane, ev ne karê min e, ez xwe (U bcr îş û emûran de dibelînim!)»

Gava SUo gêhîşt malê, kêUkê U ber dikê rawestiya fl U cblê xwe yên razayî U ser dikê nerî, bêdengiyeye guan c! Hemû (U xewa şêrîn dc ne, tenê bavê wî, binekî fikir xirtexu-t. Li kêle-

76

ka wî jî, xiîşka wî ya biçûk libêf ji ser çû bfl. SUo bêdî libêf kişandc scr xflşka xwe û (U ber xwe de fikirî: «Hcgcr niha ew şiyar ba fl bizaniya ez ê herim Bêrûtê, wê ê xwc çen bikira bimêza min fl bi zimanê xwe jî şêrîn bigota»:

«- Tu ê ji min re lîbanek sol bînî!»

SUo, bala xwe da hemfl neferê malê û (U dUê xwe de tiştên ku wan ê wesiyet kiri bflya, dihanî bîra xwe; cU ber xwe de jî jimart: Hibriya hevrişîm ji (Uya min re; çakêtekî eskênc ji bavê min re; cotek solên panîbilind ji xûşka min ya mezin rc... SUo, bi hemd cUê xwe danî, tu kes bi xwe şiyar nc kir û xwc nst nav nivînan... Lê ma cw ê xewa kê bê? Balgeb (U binê serê wî de ji kevir bişktu- bûye. Xwe (Uqulpîne vî aU wî alî, lê bê fêde ye... «Heger Xwedê got erê, ji niha û sê çar rojên din ez

ê U Bêrûtê bim!...»

\*\*\*

Bcriya ku SUo vê êvarê vegere malê, ew U civîna partiyê bû. Berpirsiyarê komika wan, tevî hemfl endamên xwe civiya bûn. Berî niha bi demekê, SUo nameyek şandi bû ji komita navçîn re ku alflcariya wî bikin, wî bişînin Bêrûtê, bona bikari bc xwendina xwe bibe serî û di ber re jî ji xwe re karekî bike. Niha jî (U vê civînê de, yê berpirsiyar bersiva wî da û jê re got: - Partiyê xwe da ber te, ew ê te bigêhîne Bêrûtê fl U wir heval pir in, ew ê ji te re teksîr nekin. Hema tc xwe gêhand Şam^tu gêhay Bêrûtê! Li wir hemû tişt bazir e!

SUo jî wê çaxê pu-sî:

- Ez ê bi pasportê derbas bim yan bi «Şehada Tarîfê?»  
- Na, -yê berpirsiyar lê vegerand- cv ne karê tc ye, tu xwe bi çi hawî digêbînî Şamê, bigêhîne. Ji wu- fl pêve, cw êdî karê partiyê yc!

Wê çaxê SUo di dUê xwe de got: «Na xwe divê sibc Şebdak xwe ya tarîfê nû, binivîsim, muhra muxtêr lêxim ku ez xwe pê bigêhînim Şamê!»

Di komika partiyê de, ya gundê wan, ev beye serê sê çar meban ku hercar nîqaşeke germ çê<iibe U ser anîha lawê miuctêr û qebiilkirina wî cU partiyê de. Silo û endamên komikê yên din U alîkî U dij disekinîn û berpirsiyar U alflcî dixwest  
77

ku Lazg^ê kiu-ê muxtêr bibe enciam. Yê berpirsiyar digot: «Bi anîna T ^^^n^ gund U ber me vedibc, em (iikarin êdî Newrozên xwe eşkcrc çêkin!»

Navbera Laz<sup>^</sup> fl berpirsiyar jî gelck xweş bfl, lê navbcra en<iamên komikê û T .aygîn<sup>^</sup> gom bfl. Di bin re, gotinên <nvî-nên wan digêh<sup>^</sup>tin T .aygîn<sup>^</sup> wî jî bîn bêtir gef U wan (iixwar, lê nikarî bfl bi eşkcre şerê <sup>^</sup>ikan bikira.

\*\*\*

Serê SUo U scr balgehê nabewc, xwc cUquUpînc vî alî, wî aU lê bê fêde ye; çavê wî narin scr bev. Xwc quUpand ser piştê fl çavên wî zuq man U ezmên... Dêmê heyvê bi şabîin dimizice, lê şabûn, ber bi tirs e (U dUê wî de. Wekc zarokê biçflk destê xwe ber bi heyvê fl sitêrka ciirêj dike ku wan têxe nav lepê xwc fl U bêla din ndTiyekc weke ya çîikekî şUbûyî ramanên wî, direbilîne. Hewasê wî fl bîranînên wî pêre pêre tof (Ubin û (Utewirin.

«Erê çûjîna Bêrûtê ne bêsan c, ne lîstik e! Lê dîtina bcx-tiyariyê ji çî re yc ku ne (U nav zehmetiyan rc bc?.. Bi scdan kcs berî min çîine, kar kirine, pere <sup>^</sup>êdane fl halê wan xweş bûye... ma ez nc weke vê xelkê me?... na, na... her yek bi sedc-mekî dere, ez ne ji bo peran derim, ne ji bo ku peran girê-dim!..»SUo cU ber xwc de fikirî: «Armanca min ya yekcm, xwcndina xwe bibim serî; lê ku Xwedê U bcv bînc, cz ê potina jî ji eblê xwc re bi<sup>^</sup>jiim!

Ji nişkê vc çavê wî U sitêrkckê kct... «Tu ji xwe rc binêre... çî şewq jê cUçe, kî dizane, belkî ev sitêrka bextiyariyê yc? -SUo dUê xwe xweş fikir -hema bi Xwedê ev cara yekemîn e ku U vî ciyî, cz vê sitêrkê cUbînim... Ha... ha... ha! ket, ket... (bi dengê bUind got) sitêrka min ya bedew, sitêrka bextiyariyê. Xwc-dê!... (Ube ku cz jî weha xweş bi rê de herim fl diîre wusa bi lez bêmc xwarê û bikevim?... Na, na... ew ne sitêrka bextiya-

riyê ye, ew sitêrka xezebê ye, wa ye Xwedê ew bi scr mala  
muxtêr de xist! Ew U aUyê wan ket. Gelo kî dizanc, belkî cw  
bi rastî jî sitêrka bextiyariyê be? Hevalê me yê berpu-siyar jî  
îro pesnê mala muxtêr cUda, pesnê Laz^ (Uda!? Gelo kî (U-  
zane, (Ube ku ew jî bextê Lazg^i bfl, bi ser mala wan de çû?  
78

Ma belkî berpirsiyarê me jî dawiya şcvê here mala wan fl be-  
mû tiştî ji wî ebmeqî re bêje, û bêje ku SUo ciixwaze bere Bê-  
rûtê!?

Bi

Xwcdê,

heger

ew bênamîisa bibibîze,

ew

ê ji

bcsfl<iiyê bibebicc.»

SUo U xwe qebr anî fl di dUê xwe de dikezirî: «Ax!... Ez ê çi  
bikim!? Gerek min ji berpirsiyar re bigota.»Lê bcr û her ew U  
ser qerarckê fl buyarekê ranecUwcstiya. Her gavckê fl gavckê  
tiştêk dixwcst. Ku U gor xwestina wî bibûya, (Uviya bû çax û  
dem tcqnckê bi şfln dc vcgeriya, an jî ne Uviya... Ev çend û  
çend car SUo siqêfa ji xwe re (Ude fl xwe şermezar (Ubîne. Tu  
kiuckî ku v/î kiri be fl dûre poşman nc bûbe, tuneye. Ê carina  
jî, ji xwe re (Ubêje: «Heger ji destê min bihata min ê aqUekî  
din ji xwe re danîya, hema tim û tim poşman im!»Diya SUo jî  
carma wUo jê re (Ugot: «Tu beftdiU yî, teqlomeqlo ^» Lê sû-  
cê kê ye? Kê ez wilo perwerde kirime? Ax!... -bflmeke kiir ki-

şand fl U kêleka xwe nerî-  
Gişt sûtê vî xenzîrê ku (Uke  
xu-exir, sûtê bavê mm e, bavê niin!»SUo xwe bi xwe difikirî û  
hêdfca xwe quUpand ser kêlekê, U xirexira bavê xwe gubdarî  
kir... Piştî bîstekê, dîsa U xwe vegerand:«Çi sûtê vî rebenê kal  
heye?... Wî ez çêkirim, xwedî kirim, ez dam xwendinê... Ma  
hîn ez çî jê dbcwazim?... Hemû bav jî vi tiştî ji zarokên xwc re  
nakin, wî rojekê jî nc hişt ez herim ber berxan, yan karekî gi-  
ran bikim... Bav per û baskan bi zarokên xwe ve nakin weke  
ku tu kes teyran hînî firandinê nakc fl tu kes masiyan bînî so-  
bayê nake, tu kes mcrovan hînî jîyanê jî nake! Heger mirov,  
bi hêz fl qeweta xwe, xwc serbest fl şareza neke, tu bêz fl qe-  
wet, serbestî û şarczajî... pê ve nake.»

Serê SUo giran bfl, çavê wî qerimîn. Destê sibê, dunya ze-  
lal bû ne bii, bêbemdê wî çavê wî çûn ser hev fl raket.

Sibehê, gava ji xew rabû, roj hati bfl nîvro. Bi lez şeha<ia  
xwe ya tarîfê nivisand, da destê dîya xwe fl got:

- Yadê, vê kaxezê bibe mala muxtêr, bUa muhrê U jêr jdne!  
Piştî kêflcekê, diya wî vegeriya, kaxez cU dest de fl çav mişt  
hêsu. Gava wê kaxez da destê Silo, gulolflcek bê hemcU wê bi  
ser de ket:

- Ha ji te re lawikê min... Sêwlekê Laz^ ne da!

79

SUo, reş fl şîn bii, hêrsekê ew hUanî, yekê cw danî, lê te (U-  
got qey lingên wî bi mîxan bi erdê ve hatinc kutan... Deqekê  
bêhna xwe girt, birûsk ji ber çavê wî çû ö weke ^qîniya ji ber  
tavê (Uçe, bi huner fl gotin ji binavê vn derket:



- Ka edalct? Ne dewlet nifîsê (Ude me, ne muxtar muhra xwe U kaxizên me dbce!... Em kî ne, ji kuderê hatine?... Diya SUo hêsrên xwe paqij fikir, xîşkên wî jî, xwe dabûn dora wê, bemû sar û cemidîn, kirtînê ji wan nc dihat. Demek bihurî, SUo cixarek pêxist fl agirê niftikê da qozîya kaxeza xwe. Gava a^ gêhîşt şîna hêsrên diya wî, te digot qey ew a^ê biçîik bû pêtflcî mczin û qiçeqiça şewitandina... rîbana sor... bibriya bevrîşîm... çakêtê eskinc... Ê sola panîbilind... ji guhê wî demediket û U ber çavê v/î binek ji daxwaza dUê wî tev wan dişewitî.

80

CIVtN

Gotmên ku wê şevê Şêzad bUîsti bfln ji bîra wî ne diçfln. Her kêlîkê radiwestiya, pirtflka xwc digu-t, dbdst binçengê xwe û gotinên wê şevê û çû-okên ku tê de bUîsti bûn, yek bi yek dihanîn bîra xwe... Ev roja duduyan c ku ew bi vî cflreyî nikare du xêzan U ser hev ji pirtflka xwe bbcwîne! Ger pu-tiikê vecUke jî, gotinên wê şevê, cU serî de dbdbdlin, U bcr rêz (Ubin û şûna tîpê pu-tûkê digjrin, nikare ji bin bandora manên wan derkeve.

Taqekirdin (îmtflian) nê^ cUbe, rojên berî wê jî, girîng in. Şêzad berî wê şevbibêrkê, bcr roj, danê sibê û êvarê ra(iihîşt pirtiikek xwe û diket ser riya sînorên tenan fl dixwcnd. Gun- (Uyan hisreta xwe bi lawekî wekî vw jû û jêhatî dihanîn. Cari- na  
gotin jî  
U

ser

derdUcetin

«Camêr

dbcwazc

yekemînê

dersxana xwc dcrkeve!» Ew jî, ji cerga ku ji bajêr batiye gund, bona xwe hazir bike ji taqekircUnê rc, tu karî nakc ji biU xwendinê. Kêm caran dere nav gundiyan. Heger carina pêrgj 81

wan cUbe jî, gelekî U wan nasekine. Hema ku ji mal drciikeve, devê pu-tiika xwe vedikc û wê nagire beta vedigere fl digêhîjc devê deriyê malê.

Lê ev du roj in ku xwendin ji ber naçe. Ku pirtiika xwe vedike, nav fl gotin û ciyê ku di wê şevbUiêrkê de bibîsti bfl, (Uhatin ber çavên wî. Ê ew niba carina ji xwe rc ciibêjc: «Dunya U kuderê ye û ez U kuderê me, min xwe ji hemî dunyayê qut kuiyc fl dayc ser pišta xwendmê, bê gflman gelek ji şevbUiêrkên wilo xweş di ser min re buhurîne.»

Hcrtmn ku derdUcet, serê xwe ji ser pirtflkê ranc(iUdr, tc bombc jî U ber biteqanda, çavê vnji tipên pirtîikê demediket, lê îro tiştêkî nû di serî de dbdbdle, U hawirdorî xwe dinêre, U şopa xwe ya her roj, U ser rê dinêre. Hat bîra wî, «Gelo gava cz bê serî U vê riyê diçûm û dihatim, çiças tiştên xweş U dunyayê diqewimîn?»

Hê(U hêdî duneşiya fl bi çavên xwe yên

zelfll U hawirdorî xwe dinêrî... tu dibêjî qey cv cara yekemîn c zad û dexla, kulîUc fl giyayên rengoreng cUbînc. Dengê çîikan

û zîqezîqa sitranên beratan ku bilind bUind dirêsm, baskên xwe U ba dUcin û tu dibêjî qey dîpeyivin... Sitiriyên kerengên biburî bi ser simbUên geniman ketine...

- Erê... Erê. -Şêzad di ber xwe de got- Her tişt tîn guher-tin ku merov nerîna xwe U ser wan qut bUce, zad her sal U er-dekê çê dibe, lê sal bi sal zadê teze derdikeve, giya fl kulflkên nfl pê re hêşîn (Ubin, kereng û pîvongên nfl U dora kortikên kevin derdikcvin. Beriya şeş beft salan, bi awakî din min U van tiştan ha

dinêrî... Lê niha tu dibêjî qey ez merovekî din im... lê miheqeq ev tiştana jî ne yên berê ne!

Qursa Royê ber bi her mezin dibe û ber bi rojava da (Uçe, cwrên sivik jî U dorê tîn ser hev, weke xêzikan U dorê çêdi-

kin. Şêzad serê xwc rakir... wa...! Çi ye lo...? Tu ê bêjî eyn xe-lekên çiyayê Torosê nc, şiklê di putûka wî de, piçekî jî ferq nakc... Lê ewrê (Un, yê U hember... Sibhane-el-la!.. eyn zUa-mekî bi kum û koloz e, tu ê bêjî qey wî zUamî rahiştiye tevşokî mezm û pê ketiye, wî çiyayî diherifînc! Şêzad bêhnekê ra-wcstiya, çavên xwe fuikand fl dîsa U wîşUdê dora qursa royê hatiye hev, nerî... Haho...! -Xweziya xwc daqurtand- Tişteki

82

dûrî aqUan e! ZUam tehteke mezin ji çiyê birî, lê cw teht, hê(U bê(U (U qursa royê dc tê veşartin, ji bêla Şêzad ve nema per-çekî mezin jê tê xuyakirin, U ser dibe sl Te digot qey nava Şêzad bebekî ricifî, wekc yckî ku sermayê bbcwe. Tevanokên sar jî laşî wî gu-tm. Ji bo ku wan «tiştên vala» ji serê xwc der-

xc, pu-tûka xwe vekir fl (U ber xwe de bi dengckî bilind got:

- Qey gotinên pîrika min rast biîn ku digot: «Xwedê teala beywanatên mizir ji erdê dik<sup>^</sup>îne ezmana, ji bona ku mezere-tê negêbînin insan!»

Roj hêcU hê(U derc ava, zerayî U şflna wê dimîne. Ji aUyê gund ve, mayêmayê keriyên pez, reyandina kflçikan, dikevc guh. Tozek giran jî serê gund gu-tiye, tu ê bibêjî qey du kerpîçên sax U scr bev tê de ne mane, tev bûne ax û xwclî, toz fl ccacok. Şêzad dîsa pirtûka xwc gut, berê xwc da mal. Ewî bi kul fl hesrct (U ber xwe de got fl mitale kir:

- îro jî çû, vala!.. Ev du roj in derbas (Ubin, min hîn pelek jî cU wan de ne xwend! Vê şevbihêrkê çi anîn serê niin?Xwedê! Hişt ku xwendin U ber çavê min reş bibe, bişt ez ecêba bi çavên serê xwe U ezmana bibînim; bê çawa bût xwe didin ber şewqa royê û dbcwazin bbcwin; bişt ez çiya û zUamên rastîn cU ewran de bibînim; liişt ez bala xwe bidim şopa xwc U scr rê; bişt cz U dengê çûk fl beratan guhdarî bikim...

Şêzad ji nû ve şevbihêrk ji serî heta binî anî bîra xwe:

\*\*\*

Pêr êvarê bû. Gava Şêzad weke her roj ji xwendmê vege-riya mal, bi rê de, lawê cîranê wan Mervanê Eazo pêrgj wî bû û jê re got:

- Şêzad, mêvanekî me jî pir ezîz û delal hatiye, ma tu nax-wazî bê, ji xwe re lê guhdarî bikî? Wî Berzanî cUtiyc, ji wir tê! Êvarê, Gava Şêzad çû mala Ezîzo, ma behetî, bema te cU-got qey temamê guncUyan hati bûn ser hev, rê fl rêwanî (U bundu- de tunc bfl. Hemû U ser qelavîska riiniştî bûn, ji biU yekî tenê, ew jî yê mêvan bû. Ciyê wî, ne ewqas fueh bû, U vi

aU fl wî aU vn du balgeh (U bin kêleka wî de bûn, weke tu vn têxe nav du dîwaran. Heger balgehek dm bidana kêleka wî, serê mêvan jî nema dihat xuyakirin. Yê ku ne U hemberî wî

83

rflniştî bfln, ji qotê vn pêve, tu derinê wî nc didîtin. ZUamekî hûrik fl simbêl zirav bû. Tcnê kefiyckc bê cgal fl cUên wî yê paqij, (iihişt ji gun(Uyan bê kifşkirin.

Şêzad gava derbas bfl, sUav kir fl destê xwe nc da tukesî, lê wî texmîn kir ku yê mêvan bi nerîneke din U p>entolon û gumlikê wî yê bajarvanî nerî.

Yê mêvan gotina xwe bir serî... « Zimanê me yek e! Erdê me yek e fl bi ser hev ve ye, em niUetckî cuda ne, em ne tirk in nc ereb m fl ne faris in... Welatê me Kurdistan e, ciyê xêr û berketê ye, bemfl maden û zîv fl zêr c... Hmek (Ubêjin: ku Bcrzanî, kanc (U şev fl rojekê de bigêhîje vê derê! Em fl bemfl kurdên U cflianê deqekê jî ji bîra wî naçin!»

Şêzad weke (U xewnekê de bii, bawer ne dikir ku ev cw bi xwc ye û zUamekî ji cem Berzanî hatiye, van gotman jê dibUîi-ze. Wî ji xwe dipusî: «Gelo ev zUam kî ye? Ji kuderê ye?

Xwenda ye, yan ne? Heger xwenda be, çi xwendma wî beye? Çi xwcndiye?..» Lê cU gel van pirsan jî, baweriyek pê re çêbfl, wekî ku U dawiya xeUcê bimîne û pirsma ji xwe re jê bUce. Ê Cixrina jî, ji xwe re digot:«Helbet ev merovekî mezin e û gelekî qîmeta wî U cem Berzanî heye, loma baweriya xwe pê aniyç fl şandiye nav xelkê. Heger ew bibîne ku ez pirsên hêja jê (ii-kim, beUcî ez têkevîm serê wî û hema ji min re bêje:

Karê

xwe bike, ez tc bi xwe re bibim!»

Gelek caran, gotmên mêvan ew ji civatê dîrdixist. DUişt U ser tiştê dîtî û nedîtî bifikire. Gava mêvan behsa buiek qehremaniyên pêşmergan dikir, ew jî bema U ser wî bajî <iîçû... Xwe didît pêşmergakî di rext û fişekan de pêçajî, keleşînkofek (U dest de ye û raberî neyaran hatiye û wan weke zadê tu bi dasê biçinî, dide hev û dikuje... Hingî nav û deng pê (Ukeve, Berzanî bi xwc dişîne pê û pê re (Upeyive. Destê xwe U piştta wî dbce... «Ha ji te re neynika ku meriv teyara jî pê dbdne!...» Şêrzad dUcet xem û xeyalên kûr û dûr. Lê carma jî, ku U çavê mêvan dinêrî û gotinên wî yên UbUbî diketm giJiê wî, ji xwe bawer ne dUcu- ku kari be tiştêkî ji van gumanên xwe bîne cî. Wê çaxê jî bi melûU U xwe vedigcrand: «Ez hîna biçûk im, hîna xetê simbêla min derneketme... Heger cz ji mêvan re tişt-

84

tckî wilo bêjim, ew ê U min guhdarî nekc... Ew meheqcq zUaman dixwaze, zarokên wck min, ji wan re nabin .» Ew, hcr weke (U xewnekê de bii, ji xwe bawer nc diku- ku tiştêkî wUo bibînc. Gava çavê wî U yên hcvalê wî Mervan ket, hcbekî mizicî û (U dUê xwe de got: «Mala tc bezar carî ava be, te ez anîm vê civata xweş.»

Wî her U mêvan guhdarî (iikir û cU bcr xwc de jî pirs ji xwe dikir. Gava dihat bîra wî ku pu-sina bUce, qirika wî ziwa (Ubii, (Utirsiya ku hinck ji guncUyan jê re bibêjin: «De here sêwlekê heram, zarokê do ye, xwc çi şareza (Ubîne!» Loma jî gotinên xwc fl pirsên xwe tcvde (U dUê xwe de (iîhişt.

Yekî ji hazU-an, gotma mêvan buî û pirsî:

- Erê pismam, ma gelo ku Berzanî bi ser mc de ne bat, yan nikari be... em ê bi xwe çi bikin? Ciyê me erdekî rast e, eskerck tenê, kane me giştan bide ser bev?

Yê mêvîm hinekî rawestiya, mizicî fl te digot qey awirê wî vegeriyan ser Şêzad, weke yekî ji xwe re bêje, «Tu ji xwe rc U aqûê wî, çi pusan dike?!» Şêzad jî bi xwe dixwest pirsekci wilo buce, lê wî (U xwe dernexist ku pu-seke wUo U telê wî tê, ew jî, hebekî mizicî fl piyê xwe hejand. Yê mêvan, bi pirs dcst bi bersivê kir:

- Ezbcnî, te navê dewleteke weke Hindistanê bihîstiye?

Şêzad, wê çaxê xwe fufitand û kire Uite-Uit, lê yê mêvan bi xwe berê xwe dayê fl pirsî:

- Bi aqilê min hejmara wan 300 mflyon e, ne ?

Şêzad wê çaxê gûman ne kir, wekî pirs ji wî re yc, vcgc-rand:

- Na, na, îsal dersa Hîndê, bi me re derbas bfl ye, jimara wan 580ê mflyon e!

- De min ne got -mêvan berdewam kir- vê dewletê, ma bfln zanm ka çawa xwe serfuaz kir?.. ZUamek tenê bfl, zUamek! Navê wî, Mahatma Gandî, hemû mUetê xwe ji bin destê îngilîz dendst. Ew jî çawa?.. Carekê, GancU bîna biçûk bii, cU emrê vî pismamê min de bû -mêvan dcstê xwe ber bi Şêzad kir- Hîna xwîna wî germ bû, têr merîfet ne bû bû... lê qehra zilma îngilîz, nema tehmûl kir. Carekê cw ji mal derket fl ne-85

be(U bû. Dê û bavê wî, nema zanî bfln bê U kuderê ye? Çi (U-ke?.. Lê wî, xwc ji ber tukesî venedin bû. Ew çû nav gxmd fl

bajarên Hindistanê, (Ugeriya, xortê mîna xwc xwîngcrm sor dikir ku dest bi şer bUcin, U cUjî çavsorî fl zulma îngilîzan. Gan(U geriya, geriya,... rastî çend hebên wekc xwc bat. Wan soz dan hev ku dest bilînin û şer bUcin. Demek çîi, Ganciî pir nerihet bîi, kar zû bi zfl ne digiha ser hev. Rabfl qerar sitcnd ku bcre malê, bona bmck alflcariyê ji dê û bavê xwe bistîne, wan jî bibîne ku dUê wan têkeve cî. Gandî, beriya ku herc malê, nameyek şand, tê de nivisîbfl ku ew ê filan rojê bigUiêje malê. Roja Gan(U bat, (Uya wî derketi bû pêşiya wî. Wê rahiş-ti bfl qetek hesin û kevirckî sotmê pê dbdst! Gava Gan(iî cv tiştta dît, ma behetî! Ji diya xwe pu-sî:

- Dayê, tu çi dUcî? Ev çi hesin fl kevirê sotmê ye cU destê te de?

Diya Gandî bi dUovanî lê vegerand fl gotê:

- Lawikê min, ez dixwazim şûjin fl derziyan ji mala me re çêkim!

- Lê tu zanî ku tu salekê jî çêkî, tu xelas nakî?! Yê bazû- U sflkê weke axê ne, U her dUcanê hene, <iifroşin!

Gandî, cU ber dUê diya xwe da, lê ew (U wê baweriyê de bû ku hişê diya wî kêmbûye û xurUiye. Lê (Uya wî, bi şarczayî lê vegerand:

- Lawo, ez jîweke te, tiştê îngUîzan çêku-iyç, bazu- U dUcana (Ubînim, kirîna wan jî, hêsantir e ji çêkirina van dera û şfljî-nên ku cz ê çêkim. Lê ma em ê çawa bikari bm îngilî7an ji welatê xwe biqewitînin, gava hemû kirîn fl fuotina me bi wan rc be? Em tiştê xwe pu bi erzanî <iifroşin wan, dûre duqat buhatu-, çêku-î, ji wan dikirm. Heger em xêrflbêra welatê xwc, bi xwe hilînin û deynm, çêkin û bU"roşm mUetê xwe, tu karê



mgilîzan U vir, U welatê me namîne!

- Dibêjin, -yê mêvan berdewam ku-- ku Gandî bû wek yekî ku serê vn U tirbê keve, nas kir ku çi gcrek e fl ji çi dest bi şe-rê îngUîzan bUce. Wî jî ji mala xwe dest pê ku-. Nema bi filsckî tiştckî îngilîzan ku^î û nc tiştckî mala xwe fuot wan. Ê helbet mUct bi ya wî ku-, wî çi bbcwesta, mUct jî wcke wî dUdr. Ê we-86

ke (Ubêjm, «mUet bi qaîdê xwc ye»! Hegcr qaîd riya baş û rast da pêşiya mUet fl ew bi xwe U pêşiya mUct meşiya, mUet ê gişt bide pey wî... \cc&, çi ji me tê xwestm? Divê em çi bikin? Scrokê mc çi ciixwaze ji me?.. Gelek ji me baş nizanin fl ji hev demaxin!

Gava Şêzad ev çîrok bUiîst, mflyên laşê wî rabûn. Wî baş bala xwe cUda ser gotinên mêvan, lê cU dUê wî de bfl bcsret, gclo cUên mêvan bi xwe yên dUcanan e, yan wîbi xwc dirfltiye. Carina bi nerînên hiir U kincên vn (iinêrî, lê şewqa lampê nizm fl diimana cixaran ne <ihişt ew tişteki ji hev derxîne. Şcvbibêrka wê şevê dirêj bfl. Yê mêvan gelek ^okên din wckc çîroka Gan(U U ser Berzanî jî got. Lê Şêzad wek yekî ku xwc (U dunyayckc nfl de bibîne, cara pêşîn şevbUiêrka wUo pir xeUc fl czûmct, U ser miletê xwe yê kurd bazu- cUbc.

\*\*\*

Şêzad scrê xwe yê ^anbûyî ji pirsan rakir, <iît ku dîsa

Mervanê Ezîzo pêr^ wî <iibe, jê re got:

- Mervan, tu bi Xwedê dikî, heger careke <Un ev mêvanê we bê, min haydar bike, ez ê cUsa bêm ji xwe re guhdarî bi-kim, çi şevbihêrkek xweş bfl!

Mervan, wekî arifekî rîsipî, bi şarezayê û bawerî vegerand:

- Hey ehmeq, tu çU guhê gê de î, ev ne şevbi-  
hêrka ku tu dikarî bi pîrika xwe re biqedînî, gava di zaroktî  
de ji me re çîroka «Gur fl rovî» digot. Ev civîn bfl, civîn!... Ci-  
vîna partiya me bfl, te nas kir?!...

Şêzad, ma sar û cemidî, serê wî ket ber, û te (Ugot qey bfl  
bizmar (U erdê de, nema tevger jê çêbfl... Û şevbibêrk bfl gi-  
rêkek mezin ji têderxistinoka, di serê wî de digeriya, disinci-  
rand. Gotm fl çîrokên tê de bihîsti bû, dawiya wan ne dihat.  
Û (U wan rojên girîng de, yê berî taqekirdinê, her roj danê  
sibê û danê êvarê Şêzad radihişt pu-tûkek xwe fl çUda scr riy-  
an... lê xwendm qet ne U ser bala wî bû. Bû bû weke teyrê ku  
ji refê xwc bunîne, hertim <ii mitale fl bîrên kûr fl dûr de bû.  
Her roj şiklên nfl di cwrên ezmên de U ber çavên wî çêdibûn  
û te bombe jî U ber wî biteqanda, wî nerîna xwe ji wan qut ne  
dikir.

87

Wcke dcmsalekc nû şflna yeke kevme bi^e, Şêzad jî pe-  
lek bû fl ji dara xwe ket, tu ramanên berê (U scrî de ne man.  
Te (Ugot qey ne ew Şêzadê berê yc ku «Dbcwest yekemînê  
dersxana xwc derkevc\* nema du xêz fl hevok ji putûkên xwe  
xwend... Gava bû wexta taqekirdmê, wî karê xwc û bajêr jî nc  
kir.

88

RESÛL

Berî sê mehan, Resûl bû bû melê gundê Avsîra. Ew jî piştî

tifaqa guncUyan bi bavê wî re, Şêx Tace-dînê Kerkim(U. Çend rojên pêşîn, ResîU bi qedir û qîmet U gimd derbas kirin. Gun- (iiyan, ne dihişt ew danekî bi tena xwe U mal rûne. Her rpj U malekê bi şîv dibfl fl civat U dora wî (Ugeriya. Çendak derbas bû, ResîU bfl weke yekî ji gund, bi ser sbdetê bemû guncUyan vc bfl; nas kir bê kî çi balê wî ye, kî çi kul û derdê wî ye. Lê yekê tenê bişê wî biri bfl; nizanî bû wckî cw bcrdu keçikên ci- wan û bedew yên ku ji mala Hecî Hemîdo derciikcvin, k^an ji wan keça wî ye û kîjan jina wî ya piçflk e! Yekê ji wan dUê v/î dikewgirand. Şeva ku U mala wan jî bi şîv bû, ber ku çavên wî U yên wê dUcetin neqrîsk ji dUê wî diçfl, lê helbet, weke mele- kî şareza ne dihişt ku kes pê derxe.

GuncUyan jê rc digotin «Seyda», lê navê wî yê rastî ResîU bfl. Xortekî 25 salî, bejinzirav fl bilind bfl. Hin^ dêmê wî zer bfl, te ê bigota, te ew di quşîfê de kiriye. Zerbûnê, bilatim 89

avêti bû zelaUya çavên wî û dihi^t ku merov zelûltiyekc kîir fl bêsinor (U wan de bibîne. Tenê şaşika vn ya sipîboz û temîz ku bi hosta^ U serê wî bati bfl pêçan>

(iihişt ku merov binekî

bi ûcaxî û zîyaretî manê bide wê zcrbûna quşîffî.

ResiU bi xwe tu feqetî û meletî cU jiyana xwe ne kiri bii, şe- rîet jî U tu deran ne xwen(U bfl. Tenê şeş sinifê medresê tc- waw kiri bû, cw jî bi teşqele fl çetinî, ji ber ku di zaroktiya xwe de pir mizu- bû, fêlonek bû. Bevê wî jî, şêxekî bi nav fl deng bî, (Utirsiya ku Resûl di (Ubistanan de xisletê wî hîn xe- rabtir bibe, ew ji (Ubistanê dendst fl wê çaxê ji xwe re (iigot:

- Heft zarokê min hene, evaya jî bUa bibe bi goriya wan. Hesêb bike ku çênebû. Birayên wî, el-hemdıilfl-lah, ji dîn fl dunya xwc jî ne man. Lawek xeys derket, wê Xwedê rizqê wî jî bişînc!

ResiU mezm bîi, bû zUam, lê tu mercmên bavê xwe bi cî nanîn. Ji nişkê ve Xwedê deriyê fereca xwc vekir: XeUcên gundê Avsîra batin cem, xwe avêtinê da ku melekî ji wan re bişîne. Wê çaxê Şêx Tacê-dîn, hema kurt buî fl lawUcê xwe, RcsîU şand û ji xwe re digot: «Belkî Xwedê teala, vn taU-cmir hidayet bike û ew jî bibe weke hemû buayên xwe yên din, melekî zane û bi şîmet!»

NUia jî ku Resûl bi tena xwe carina cUmînc, ji xwe rc (Ubê-jc: «Bavê min ez kirim mele jî, lê min bi nêta xwe, tiştêk ji xwe re nc ku-iyê! Gelo ne ehmeqî bfl mm bi ya wî kir!... Çima min jî weke gelek hevalên xwe, ji xwe re karekî din nc dît?...»  
Û carma jî, ji xwc re (Ugot: «Ez bi kêrî tiştêkî ne batim, loma (Uvê ez ya bavê xwe bi cî bînim?»

Ji «mele» ResîU re, ne gelekî çetin bû ku awayê melê «heftUmî» bike. Ew cU maleke oldar dc mezm bû bfl. Helbet bînek ji awayên melan, cU serî de man. Niha jî dizane cUvê çi bUce, ta ku gimcU jê razî bin, qedrê wî bi^in... Heger carina (U civatan de, hinekan pirs jê ciikirin wî yekser bavê xwc dihanî bîra xwe, bê çawa bersivên xeUcê (Uda. Ew jî, teqnekê difikirî, U dêmê pusker ne dinêrî û bi teqU û giranî bersîva wan (Uda.

Erê mele Resûl şerîet baş nizanî bfl, lê vn xwe^Uc zanî bû

90

awayê melan bikira. Di civatan de pir giran bû, kêmlcbat û peyv bû. Xwc tev bemû kar û emiîrên dunyayê ne fikir. Lê (U hun(iirê xwc de, qijeqij ji nava vn dibat. Ji xwe re (Ugot, «Ez ê awayê melan bikim, heta ez bibim melê rastîn.» Lê carina jî bi xwe (iikeniya «Ez wekc roviyê awayê şêran bike, gelo heyc rovîbibe şêr!»

Ku Rcsûl bi tcna xwc dima, bi kul û êşên xwe (UbiUya. Tu kesî bi derdê dUê wî nizanî bfl. Ew (U jiyaneke dunya^ de (U-fikirî. Jiyanc ku demên wê, yê wî ba, awayê tu kcsî nc kiri ba. Ken^ çi xwesti ba, goti ba; çi bi destê wî bati ba kiri ba. Lê niha jê tê xwcstm awayê mclan bikc, ji bona dawiya salê zikata xwe bistîne. Tenê vê yekê dihişt dêmê yê rastîn were veşartin û dêmê nimûne kifş bike. Di meba sisiyan de mele ResîU pir nerihet bû bû. Hema ku U nav gundiyan rfldini^t, jê werê ku laşê wî girêdaye, yan ne yê wî ye. Ew nikarc her tevgerê bike, ber gotinê bêje... Di mejiyê xwe de tim gotinên xwe bUdibjêre... vê gotinê divê ez bêjim, vêya (Uvê nebêjim... Ev ya melan e, ev nc ya melan e... Bavê min (Ugot, fUan mele^ weha (Ugot! Divê ez awayê wan bikime ku ez bêm xuyakirin, mîna melekî şareza, zana, «heftUmî»...

Ji ber vê teklûfeta ku mele Resfl xwe tê dc didît, wî nema gelekî dixwest tev U gundiyan bibe. Êvaran, hema ku Umêja eşa U pêşiya gundiyan fikir, tevdîra çflna mal <iikir; ji bo ku bi tena xwe bimîne, awayê kesî neke, çawa bbcwaze welê jî bike. Gava digêhîşt xaniyê xwe jî, yekser şaşika xwe davêt, taa cU-kct nav ciya û diket mitalê kûr fl diir. Ew bi tena xwe dima, lê wckc xwc jî dima, bê şaşik fl rflçikê meletiyê. Çi dixwest (iikir û kî bbcwesta dibanî bîra xwe.

Carina destê xwe cU ser laşê xwe re cUbir fl Resûlê biçûkê fêlonck dihanî bîra xwe. Û di dilê xwe de jî carina cUgot: «Min tiştck beta niha bi nêta dUê xwe ne kiriye, lê Xwedê kerîm c, va ye mîisim bat, ez zikata xwc ciistînim û bcrê xwe cUdim bajêr. Ji xwe re karekî din (Ubînim! Ma cz wcke îsayê mele Mihemed nabim ku ji xwe re dikanek vekiriye, melck jî ne bi halê wî ne?... Xwedê kerîm e!... Hecî Hemîdoyê kal, êvaran dikcve nav pêidlê vê keçika bedew û ciwan, û Melc 91

Resûl bi tcna xwe (U nav van Uvînênsar û ccmi(U dc vcdimale, dUerize... Ax, ma ev rastiya Xwedê ye!?!... Kalekî pîr, mêrê du jinan e û xortekê 25 salî, destê xwcdiser laşê xwe re (Ube fl tîne, (U besretan de ye!»)»

Roj bi roj ev halê Resûl c, her roj bcma limêja cşa U pêşiya gim^Uyan dike, dere mal û dikevc mitalan. Roj bi roj jî, dêmê wî zertir dibe, tu (Ubêjî qey tu wî (U quşûfeke nfl de dikî. Gun- (Uyan jî, ev leza Mele ResiU bi bawakî din fêm dikuin. Gava hinekan jî ji hev cUpirsîn, Sofî Ebaso gun^Uyê wan û mirîdê Şêx Tace-dîn bi xwe bîî, yekscr bersiva wan (Uda fl (Ugot: - Mclle Resiil wcUyekî Xwcdê ye, van şevê dirêj pêde, tcna xwe, di limêj û fl)adetê de derbas <iike. Dunya hîç ne U ser ba- la wî ye. Xwcdê me têxe ber xêr fl bercketa vê malê!...

Sofî Ebaso, limêjek çî ye, bê cemaat ne (iUcir. Û karê wî, U nav gimdiyan, bebsa mala Şêx û zarokên wî dikir. Wî digot: «Ev heft salê min e ku cz mirîdê vê malê mc, biin (Ubêjin ev zerbûna dêmê mele Resûl ji çî ye?... Ev îşareteke ji ba Xwcdê ye... Yê me gundî, bema em limêja xwe ji bustuyê xwe derdbc-

in, em dikevin dunya bi qirêj, dîsa gimehan dikin. De Mele RcsîU (U vî emrê xwe de, şevên dirêj (U zikir û îbadetê de cU-qeciînc, bi melayflcetan re di suhbetê de ye!... EwUyayên Xwe-dê giştUc weha ne, kê m gotin in, lê pu-îbadet fl emel m!.. » ZUaê Mele Resûl fl hêbeta wî, di nav gundiyan dc baş bcla bû bû. Ew ji ser zimanan ne diket. Wey U wî îcar, yê kari be ji wî wextê Mele Resiil yê hindUc, deqekê ji xwe re lê guhdarî bUce, waezeke wî bibUîize, têkeve suhbeta wî! Hinekan ji guncUyan guman ciUcirin, «Wekî Şêxê mezin ber rehmetê, meheqeq wê Mele Resûl şûna wî bigire!» Gava ev ilmê xêrê cUgiya bavê wî jî, ew bê per fl bask difu-iyâ fl ji xwc re (Ugot: «Xwedê teala rflçUcê me sipî kir!» XeUcê Avsîra keti bûn tatfllekê. Wey U wî be, yê ku kari be xewnekê bi melê gundê xwe bibîne. Hela pîrekên gimd, ber roj xewn pê didîtin: Hinekan didîlin, Mele Resûl ji şaşUcê bigb-e heta solê, (U gewr de pêçajî û weke melayflcetan U scr kursiyckc ji zêr û zîv, di nava bUiuştê de rûniştiye. Dibîşuî, şewq û nûr jê dibarî. Hinekan jî digotm, ew dîtme bi kesk pê-92

çayî, (U nav gîU fl baxê bihuştê dc, bi pcr û bask (Ufiriya. Lê jina Hecî Hemîdo ya mezin, rebenê gava (Ubilûst ku xelk van tiştan (Ubêjin, ew diket tatflleka xwe û digot: «Xwedêyo! Tu bUce ku şevêkê Mele Resfl, bê xewna min û bema destê xwe yê bi bereket, di ser laşê min re bide fl ez bi bcmU bibûn; ji bo ku ev bêbava bêwiya min, bupihazir, U ser mala ku min bi xwêdana eniya xwc daye ser bev, rflnenê!» Xewnê gunciiyan pu <iibîin û gotinên wan U scr melê zêde

(Ubîîn. Ta cxtiyarê Hecî Hemîdo bi xwe jî kete wan gumanan ku Mele Resûl jê re «niviştekekê binivfee, belkî Xwedê teala la-wekî bideyê, yan na -Xwedê bi rebm c, lê cz bi qurbana Xwcdê bim- va jina biçîik jî, salek wê qedyayc, hîna jî newqa wê weke hunguUskê ye! Divê meriv U halê xwe bipu-sc ku Xwedê lê were rehmê!»

Mele Resûl jî, pêre pêre xewnên gun(Uyan û gotinên wan, cU rêya Sofî Ebaso re cUbihîst fl pêre jî dihisiya ku qcyd û merbet (U jiyana wî de pu- dlh'm. Halê wî jî ji ber wan xerab (Ube, lê wî tehmfl dikir fl xwc U bêviya mîsim radigirt. Di gund de, ji biU Resûl kesekî bi xwenciin û nivîsandinê nizanî bfl. Ew bi xwe, bi awakî cU dunyayê de (iifikirî fl guncU bi awakî. Carina ji xwe dipirsî: «Gelo beta ken^ ez ê bikari bun bimînUn weke ewUyayên bê gimeh, mîna cU xewnên van gimdiyên bê liş de? Min çi anî serê xwe, bi ya bavê xwe kir? Çima min xwe bi qeyd fl merbetên van gun(Uyên nezan fl ehmeq guêdaye? Hezar kar ji min tê fl min xwe xistiye tora xewnên vala û bêrûmet! Ez di cehenima Xwedê de me û xelk min di bihuştê de dibînin!»

Êvarekê, beriya ku roj here ava, Mele Resûl dîsa wekc hercar, bi jiyana xwe ve mijûl dibû. Geh U bundir (Uçû û dihat fl geh U ber pencerê radiwestiya û ji xwe re U tevgera nava gund (Unêrî. Carekê ji nişkê ve dît ku ew keçUc bi xwe ye... Ya ku dîli bû ji mala Hecî derdiket. Jinikê komek berxÛc dabfl ber xwe û bêcU hê(U bi meşek nazik (U ber camiyê re derbas dibû... < Ax... gelo ew jî xewnan bi min (Ubîne?

-Mele Resûl

keserek kîir kişand û nerîna xwe ji reşê jmikê qflt ne kir-



Bi

Xwedê, madem gundiyan tevda xewnên salihan bi min dîtinc,

93

hclbet wê jî niba tiştin anînc ber çavê xwe. Ah...! -Bi dengêkî bihîstî Resûl got fl keserekc kflr kişand- îro rojeke reş e, rojeke neqcwimî ye (U jiyana min de; îro ji min re (Uvê ez xwc nas bikim. Ez kî me? Çi ji min re cUvê?... îro (Uvê navckî nû U xwc bikim, yan jî, bimînim Mcle Şeytan, yê ku cUçe dikeve xewnên pirekên gund!»

Demcke kurt derbas bfl. Ew pîreka beriya gavekê cU bcr rc dcrbas bû bû, (îîsa (U şopa xwe re vegcriya... Mele Resûl lê (iinêre fl keseran diki^îne... Tilmikê laşê wê, bi nazikî ciirehelin û serê wê jî wckc mihîna ber(ia^ bilind fl bi kubarî U ba (Ube... Resfl, U ber pencerê bû wekc darckî bêruh û dUê wî (U sînga wî de bê hcmdî wî ciireqisî... Jinik jî, te digot qey bi ser wî ve bfl bû. Wê jî, bêjî ku gumanê bine ser tevgera xwe, (U bin çavan re lê dinêrî... Dît, destek U ber pencerê îşaretekê (Udeyê, lê wê serê xwe hejand û bi riya xwe de çfl. Reşê jinikê ji bcr çavê Resûl ket fl hêdfca bi gavên sist ji ber pencerê bi şfln dc vejeriya... Çogên wî dirchilîn û xwîna gevez, bi xurtî di tamarê v/î de (Ugeriya. Xwe U ser sîcadê ramedand. Destckî xwe xist bin serê xwe fl ji nfl ve, jinik, bi goştê xwe ve û bi tcvgera xwe ve cU serî de geriya.

Jinik cU serî de cUgere fl «Tebê şîrî, beta pîrî» Resûl destê xwe di scr canê xwe re dibir û «Rcsûlê fêlonek» tanî bîra xwe. Xwc (Uqulipand vî aU û wî alî, te digot qey agir di laşê wî de ye... Jinika ku nêî^ wî ne bfl bfl, pê re (Upejivî...

«Bi şev û bi

roj cz (U xem û xeyalên dîtina te de me!...)» Ew jî, bfl firtefu-ta

wî U ser sicadê, xwe (Ubc û tînc . A.A. A..b Ab... Ahhh...!

Ev cara yekem bû ku Mele ResîU (U gimd de, U xwe xweş  
(iibanî.

Bê deng fl his, ResîU teqnekê U ser sicadê ma vekctî. Li

kêleka wî, mêşek mezin, (U sêniya mast de dikir vingeving, wî

lê ncrî, (U ber xwe de keniya û got:

- Mêşê! Tu bimirî jî, ez te deraaxim, bi per fl baskê xwe,

xwe xelas bike. Yê min, ehd U ber Xwedê, ez nema alflcariyê

ji kesî dixwazim fl alflcariya kesî jî nakim! Ez xwe ji werta Av-

sîra dendm, ez ê jiyaneke nû bibînim û bi çavên serê xwe U

dunyayê bmêrim. Bavê min, xwe bUcuje jî, ez bi ya wî nakim!

94

Tu jî, bi xwe, xwe xelas bUce!

Rcsûl cU vezelandina xwe de, sist û pûç bfl bû. Jinik nema

U ser bala wî bfl. Lê serê wî sincirî bii, (U awayên rengoreng

de difikirî. «Ki^an qehpebavî û qehpebavê ez cU bihuştê dc

dîtîme? Ez çêtir bi xwe zanim, gerek ez U ku bim!»

- Heger cz bi ya xwe nekim, ez ê tim û tim cU vî haU dc

bim! -ResîU ji xwe rc (Ugot fl (UbUand. Li derve ro çû bfl ava,

tariyê xwe bera erdê dabfl. Melc RcsîU bi kotekî xwc da scr

nigê xwe, rabû. Destê xwe avêt neynikê, pê U dêmê xwc nerî:

- «Sîmatiin fî wicûbîhim min escrî cl-su-cfldî»- Zcrbiina

dêmê saliban, ji nimêj fl taeta pir c!... Dc ka ez berim U pêş

van chmeqan, limêja cmaetê bikim, ji wcUtiyê re bindik

maye, va mîsim bat!

Wekc her roj, Mele RcsîU U pêşiya gimcUyan limêja ce-  
maetê kir fl cU dUê xwe de ji wan re siqêf kir. Lê Hecî Hemî-  
do û Sofî Ebas, dUê xwc xweş dUcirin, wekî limêja xwe bi  
weliyekî ji ewUyayê Xwedê re dUdn. Piştî limêjê, guncU ji bev  
belav bûn, lê Sofî Ebas hebekî xwe ragu-t. Gava Mele Resûl  
karê xwe kir ku rabe fl here mal, Sofî ber bi wî bat, cUlê xwe  
pê şewitand û got:

- Seydayê min, ez qurban!... Xwedê ne gotiye xwe bi taetê  
bikujin! Yekcar xwîn cU dêmê te de ne maye!

Mele Resûl mizicî û di <iUê xwe de got «Ehmeqê ebmeq!»  
lê binekî serê xwe rakir û bêjî ku awira xwe bi carekê re têxe  
ya Sofî, jê re got:

-Sofî Ebas! Madem sehet tehmûl cUke, cUvê merov qusîrê  
nexe wacibê Xwedê. Wê rojek bê, em ê nikari bin bi vê sehe-  
tê wacibê xwe bi tamamî bi cî bînin. Xwcdê çi kiriye betal na-  
be!

Sofî xwe firfitand, da kêleka Mele fl bi bev re dfl sê gav  
avêtin. Gava ji camiyê derketin, Sofî Ebas, bi şerm û fecUyck  
melfil, pirsî:

- Seydayê min, min efû bike... Ez... Li min nçgirc... Li min  
ncgu-e...

Mele Resûl, bi serbestî lê vegerand:

- Bêje, Sofî Ebas, fedî neke!

95

- Laneta Xwcdê U pîrekan bê... Serêşa dunyayê hemû ji  
ber serê wan e... Pîreka Hecî Hemîdo ya piçik, Zînê, xwe  
avêtc min ku cz ji te re bêjim, wekî tu ji fedU û kercmeta xwc

re jê re kaxezekê çêkî, ji bo ku Xwedê lê bê rchmê, ewladekî bideyê!

Hîna Sofi gotina xwe ne biri bû sêrî, xwîn bi gujîn (U laşê Mele dc tcv rabû û lerzeke sar bi bedena wî girt ku bişt mûyê laşê wî rabe. Resûl hilmek dlrêj kişand û teqnekê rawestiya. Di deqekê de, tc digot qey dunya tcvdc <ii scr hev re qulapt. Ew gewdê pîreka têgoşt; tilmê laşê wê yê weke cewdikê berxweş av U pêş fl paş wê dirchilîn; meşa tenatena nazik... gişt U ber v^ (U rûçikê Sofî de weke diîmanê tên ser hev... Gişt niba U ber wî nc, gişt mane U bendc gotinekê...

Gotineke ku ew ê niha bihêle ew bemfl xeyalên wî bibin rastî û (U nav de vegevize.

Sofî Ebas U bende gotineke Mele deyjihevî ma.

- Hêêê!...

Mele Resûl bê mad lê vegerand:

- Ez ê bifikirim, sibê ji te re bibêjim.

Bi gavên giran, Mele Resfl ji Sofi dûrket... Lê zimîniyeke weke zengilên deh keriyên pez (U guhê wî dc (Ugere. Ew zengUekî tcnê ji wan xweş nas dike, ki^ cUkc. Ew jî weke vizeviza baskên mêşeke ku di nav dimsê de ma be, yan jar xwari be... dike vizîn û baskên wê gewdê wê biUnd nake. Hema ResiU gêhîşt mal, du sê deqan U bundir çû û hat, dflre nivênên xwe danî, xwe (U nav de kire weke tîpa (C) fl xwe da ser bev. Te digot qey tayeke sar pê girtiye, tu deng û hîs jê ne dibat û serê wî her bi her giran dibe. Tê de şerekî mezin (Ube û tu rê ji ber naçin... Gund... Bajar... Zikat... Hecî Hemîdo... Namûs... Nav fl deng... WeU... Melayîket... Laşê pîrekên bi g({}st... gişt (U serê wî de, di ser hev re (UquUpîn, tevUhev (Ubfln. Her yek,

zimîniyekê ji ber guhê wî tîne û her yek jî pirsekê pê rc çê(U-ke, lê pirsê mezin ji bîra wî naçe... Ez kî mc, çi ji min rc cUvê, gerek ez çi ji xwe re bi nêta xwe bikim?

Roja din, sibehê, xelkê Avsîra û ser dengê dikan şiyar bûn. Dengê Melê gund nekirin fl pêjna wî jî nema hat. Ew wê şevê 96

ji gund çfl... Ê ber yekî, ji gunciiyan, ji xwe re tiştê (iigotin... û hinekan jî wê şevê (U xewnên xwe de <îti biin ku Melc Rc-siU firiya fl bi erş fl ezmana ket.

97

SEYRO

Heger merovekî bêgane (U siika cU fl caw, ya bajarê Amfl-dê re derbas be, nabe ku U bimber dikana Hecî Gêncî rancweste, pirsê pê rc çênebe, yan jî nemîne matmayî. Di wê rêza ku dikana Hecî Gêncî tê de ye, ji biU wî tu kcsên bi şal fl şapik tunene. ZUamekî emirmezin, nêzikî 65 salî, (U (iikancke fireh, mezin, vala û duderî de rûdine û karê wî bawîşka vc(U-de. Refikên dikana wî wusa manc ku merov (Ubê qey dixwaze tcv dikana xwe, here rebmê. Hcr sê danê rojê, jinkek navscrc tev firaxên xwarinê, tê firavîna Hecî (U(Uyê, teqnekê rûdine û dûre radihêje firaxên vala fl (Usa U rêya xwc vcdigere. Ncma tê bîra berkesî ji xwe(Uyên dUcanan, bê ji ken^ de cv rfldan tê kirin U cada wan. Lê extiyarên (U cmrê Hecî de (Ubêjin, bema ji cerga ku bûye rîniştvanê bajêr!

«- Erê, ji zflde ye... hema piştî em batin, bi salckê, serxct û bmxet çêbfl.» Hecî bi xwc wcba ji pu-svanê xwc re cUbêje, dcma ku hinek jê (Upu-sin.

98

Wê çaxê, Gêncî, Seyro da pê xwe fl hat bajarê Amûdê. Û U gimdê wan, hinekan (Ugotin, ew (iaket binxctê ji ber ku warê v/î lê nc hat! U hinekan jî digotin, ji ber dê fl bavê xwe bazda, ji bo ku ji wan cihê bibc! U binekan jî digotin, ew bindestê jina xwc ye, jma wî bibêjc çi, cw nabêjc na! Lê Gêncî û Scyro tenê zanî biin ji ber çi dcv ji welatê xwe bcrdane û çîine biyanîtiyê. Li Amûdê jî tukes bi esl fl fcslê Gêncî nizanc, loma jî bemûyan jê re digotin «Gêncoyê miha(nr», yan jî «Gêncoyê kurdunc»

Çend salên pêşîn Gêncî bi wan quruşên ku bi xwe re hanî bî, îtarî dikir. Dflre zêrên Seyro firot fl pê ciikanek biçflk vekir. Ji wê çaxê de beta niha, gelek sal derbas bûn, gelek tişt hatin guhertin. Dikan berê biçîk bî, dîre mezin bû, dîrc (U-sa hat ser bev... lê jiyana Gêncî fl Scyro tişt jê ne bat guhertm. Her roj sê danan Seyro ra(iihêje firaxên ji xwarinê dagulî û (U nav bajêr rc (Uçe cem mêrê xwe fl piştî teqnekê firaxên vala ve(Ugrînc malê.

Li ser mala Hecî Gêncî, niha gelek ttşt tèn bibîstin, lê piraniya gotinan U ser zimanê wan tèn kirin, bê^ ku haya wan jê bebe. Ew bi xwe, mîna hundirekî girtî nc, kê m U ser balê xwc dipeyivin, kêmgazin in... Piştî ku Gêncî balxweş bû, çû Hecê, ji deriyê camiyê fl dikana xwe pêve pêl tu deran ne (Ukir. Mcrovekî bê mervan e, nc cU xêr fl ne jî (U şerê xelkê de ye.

Berê hersal havînê diçû Heleb û Şamê, cni û caw dihanî.

Dikana wî xemUandî û tim da^tî bfl. Rihela ku ji dikana wî bibata kirîn, rihel (U scr re tune bfln. Lê van salan hertişt bat

gubertin. Sehet, nema wek ya berê ye, hal ne ew hal e, dikan jî nc cw (Ukan e. Xclê bêgane ku cU ber <iikana wî rc derbas dibin, dimînin ecêbmayî. Dikanekc mezin, vala, beciyekî salmczin bi kum û koloz tê dc bawîşkan vecUdc. Hecî bi xwc vê yekê zane, zane ku kenê miriyan jî pê tê.

Lê destê wî bi ca-

rekê re ji dunyayê û ji malê dunyayê nabc. Tu (Ubêjî qey bi rflniştina xwe ya (U dikanê dc, emrê xwe fl dikana xwe dirêj dike... Rub şêrîn e û malê dunyayê jîşêrîn c!

Havînekc germ c, bi wexm e fl bi ecac û toz c. Tu dibêjî  
99

qey ecacokê mala xwc nas kiriye fl xwe U ber deriyê dikana vala vemaltiye. Lê kî dizane ji kuderê ra(Ubc û U kuderê zîz (Ube? Hinek bênderên nîskê xwe cUdêrin, hinek refikê <iikana nê xwc paqij <iikin, hinek rihelan dikirin... Hcd Gêncî jî (U vê demê de tim (Ubîne ku toz U ser refikên dikana wî ra(Ube... Gelo U ber çavên wî tê sêwîren<iin, yan tûmana waca nava wî ye?.. Ew ji çi be jî, Hcd nema (U xwe re (Ubîne topên cU fl cawên xwe paqij bike. Hê(U bê(U rengê wan têne gubertin, dirizin...

Hed hêdfca xwe da ser gopalê xwe, bêhnekê U cU fl cawên xwe yên kevin nerî, lê cU xwe re ne dît ku toza ser wan paqij bikc. Bi dengê nizm cU ber xwe de digot:

- Nema hêja ye, (Uvê ez ê(U nêzfld Seyro rînim, pajîza emre!  
e!

Halê Hecî van rojan xerab e, (Uponije, dikuxe, tayê digire, lingên wî nema wî bUdigire. Gava xwe dide scr gopal, bêhne-

kê radiwestc, direhUe. îro, bi zorê ji ser kursiya xwe rabfl, cU ber xwe de dûa kir, entîn pê ket û bi halekî xerab xwe giyand malê.

Havîneke germ e, bi ecac û toz e. Wexmeke wilo nayê bîra Gêncu ku cU jiyana xwe de dîtîye. Hundir nayê tehmfll kirm û ji dervc çavên saxlem jî ber xwe nabînin. Wê rojê Seyro zanî bfl bê fêde ye ku Uvînan U ser banî dayne, «Ew ê mişt toz fl ecacok bibm...» Gava Gêncu gêh^ devê derî, Scyro berî ku tu gotman jê bibfliize, pê re rabfl, destê xwc xist bmçengê wî, bê his fl deng alflcariya wî kir ku sola xwe dayne.

- Hecî malavawo, ka em ê doktorekî bbcwazin?!

Hecî hêdîka cU bin çavan re bi dUovanî U Seyro nerî, te (U-got qey (Ulê xwe bi Seyro dişewitîne. Weke deqekê bêhna xwe girt, dûre nefeseke kflr kişand... Di wê deqê <ic Hccî hemû êşa dUê xwe ji bîr kir û bi temamiya xwe kete xema îş û qedera Seyro. Di wê deqê de, ma çî hat bîra wî û çî ne bat, te digot qey (U vê deqê de, salên dirêj, şev fl rojên emrê xwe yê bi Seyro re buhurandî, tamam anî ber çavên xwe. Teqnekî ma bê deng, <ii pê rc bi gazinî got:

- Seyro... na! Ne bêja ye, ê(U dereng e... Karê ku Xwedê bi-  
100

ke, meriv nikarin betal bUce... Lê tu Seyro... Sey...

Gêncu (U jiyana xwe de gelek caran Seyro xeyidan(Uye, (U-lê wê hiştiye, lêxistiye... Carekê beriya ku (iikana xwc veke, gava hîna îtarî (iikir, ereba xwc ya tek U ber derî sekinandi bû, lê Seyro pê ve ne bati bfl. Wê çaxê Seyro (U ser bendê re U daweteke cîranan dinêrî. Dflan geriya bû, xort û kcçikan dc-



stê bev girti biin. Scyro jî qet U xwe danedibanî ku bêjê mêrê xwc têkeve dflanê, yan jî here dora govendê fl bisekine. Wê tenê (U ser bendê re sebra xwe dihanî, dinêrî. Gêncî jî, ji qcs-tî deng bi xwe ne xist. Xwest bizani be ka Seyro bêyî wî çî (U-kc. Gava wî Scyro (U wî baU dc dît, yek ne kir dudu, bema bi qamçiyê bate Seyro. Ji lêxistmê hişt ku ji ser bişê xwe bere. Dûre Seyro heftekê derneket dervejî devê dêrî, laşê wê, dê-mê wê, reş û şîn bû bûn. Ew ne cara pêşîn bfl fl ne jî cara dawîn bfl ku Gêncî U Seyro dbdst. Lê herduyan jî, riza xwe bi hev dihanîn. Tiştêk bê yê din ne cUbû. Gêncî zanî bfl ku Scyro jina malan c û «Sitûneke zêr c (U mala wî de» fl Seyro jî, xwe bi xwe digot: «Zilam serkar e, jin bindar c.»

Niha devê Hecî nema digere ku tiştêkî ji Seyro re bêje. Zane ku wê ew gelekî tehemîU kir; wê sitûna mala wî ragirt û mal jê re çêkir. Lê malê dunyayê çî ye, xwezî her tişt weke peran bihata fl biçûya.

Hecî Gêncî (U xwe difikirî... salên dirêj, xweşî fl nexweşî,... jiyana xwe giştî tîne bîra xwe, çavê wî dikutkutin, tî girtin û vedibin Seyro ber û ber (U mêjiyê wî de ye.

Seyro nema zanî bû bê çawa bike. Rabfl Uvînê Hccî rast kir, destekî xwe da ber piştê wî û bi yê cUn jî gopal da dest: - Hecî, ka rabe têkeve nav ciyên xwe, tu ê U ser kulêv hişk bibî!

Bi tcqla ku Hecî xwe xiste nav ciyan, Seyro lihêf kişand ser. Lê çavê wî bema zûq U Seyro dinêrîn. Gelek êş û kulan dixwaze ji Seyro re bêje... lê Seyro tu dibêjî qey (U <iU de ye, naxwaze Hecî bêşe û keseran biUne. Xwest ku Hecî bêbna xwe bînc ber xwe û rehetiya xwe bistîne.

- Hecî, ma te tişteki giran hUgu-t, ya te çi kir wilo hat serê te?

101

- Keçê pajûa emr c! Ma çi bikim?.. Ev sê meb bûyc ku min destê xwe nc dayc topên caw, ez hilnekişiyame ser nêrdcwanê, min toza wan jî paqij nc kiriye! Qcdcr batiye... Seyro... qeder!

- Dc bes xwe bitirsîne, Hecî, niba qedebek çay vexwe, tu ê xwêdanê bidî fl ribet bibî!.. Ma madê te naçe xwarinê, min hinek pincar çêkiriye?

Hccî Gêncî, bêhnekê bêdeng ma. Seyro sêniya pincarê anî, danî ber. Lê zanî bfl ku Scyro ji darekê kctiyc, di xema sebeta wî de yc... Seyro destê xwc danî scr cniya v/î û dîire danî ser destê wî. Hecî destê xwc yê din, ji nav Ubêfê bêdîka kişand û hêcU hêcU destê Seyro xist nav berdu destên xwe û bi bemd serê xwe ber bi wê bir, bi nerîneke nerm lê nerî, dîsa çavên xwe ^t fl ket mitalan.

Erê ji zfl de ye... kê zanî bfl ku zeman, dem fl dolab ê weha bigerc. Ê Gêncoyê delaU ê U biyanîtiyê, (U dawiya emrê xwc dc, ji merivên xwe kesî U ber serê xwe nebîne. Serxet U ku û binxet U ku! Ji hevalê wî yên kevin, U binxetê, ji biU Mele Mehmed kes ne maye, ew jî U Qanişloyê ye. Kî ê bişînc pey? Lê, ma ku ew jî bê, ew ê çi bike? Tenê ku yasînek U ser min bbcwenda, hema ez fetîs neçûma?

Hecî çavên xwe vekir û bi nazikî ji Seyro re got:

- Seyro, tê bîra te, kê mara me buî?.. Rehma Xwedê lê be, Mele îbrahîm, bavê Mele Mehmedê tacu, niha U Qamişloyê

ye. Xwczika çavê min lê keti ba, bema weke min merivên xwe  
ff^ bidîta! Rehme U bavê te be Seyro, tu ê sibe ji binekan re  
bêbêjî, yên ku cUçm Qanuşloyê, bua ilm bigibînine wî, ew tex-  
sîr nake, heger karê wî gelek tune be, ew ê were. BUa jê re  
bêjin; destbirakê te ncrihet c!

Hecî dîsa xwe ker kir. Çavê xwe girtin, lê destê Seyro ber  
(U nav destên wî de ma.

Ji cerga ku Mele Ibrahîm mara wan biriye, beta niba, ji biU  
wê, ji kesekê hez ne kiriye, kes jê bêtu- pê re ne westiyaye; bc-  
jartî pê re nc dîtiye. Erê gelek sal derbas bîin, gelek tişt jî ba-  
tin guhertin, lê Seyro ma Seyro. «Ez ê wesiyetnama xwc ji  
cîranan re bêjim, bUa tenê cv keser bi min rc nere gornê!»

102

Sê roj derbas biin halê Hecî Gêncî roj bi roj xerabtir (Ubû.  
Ji xwarinê bi carekê rc qut bfl, rojê carekê Seyro bi zor qetek  
qimer(iîn nerm dikir û gulpekdudu bera quika wî (U(ia, wexta  
lîmêjê jî, Seyro destê xwe (U(ia pişta wî û wî rîiniştî limêj di-  
kir. Lê van rojên dawîn bi vî awajî jî nema kari bfl limêj bUd-  
ra, bema (iirêjkirî fatflie û şebadcta xwe dixwend.

Gava ilmê nexweşiya Hcd Gêncî gêh^ Melc Mehme(i,  
wî ji ber xwc ve nameyek ji merivên wî yên  
serxetê re nivî-

sand

û

da

yekî

qaçax^

ku  
bigêhînc  
gimdê  
wan.  
Melc

Mebmed (U namê dc weha nivîsandi bfl. «Hcd Gênc (U xeterê dc ye, U ber mirinê yc, zû xwc bigêbînînin ser. Mal fl milkê wî û (iikana wî ê bi xelkê bunîne, ecele, ecele, (Uvê hinek ji wc bi ser dc bête!») Ê ji ber ku Melc Mehmed zanî bû ku heta nîba merivên wî carekê jî ne hati bûn cem wî, navnîşana xwc U jêrî namê danî.

«Tiima^ bu-akuj e!», ne sînoran nas dikc ne kuştin û ne bombe, tiştekan nikare wê kêmbûce... Pçrc, qu-êja dunyayê ne, merivê ku U wan bigerc tu sînor jê re tune. Qu-êj U ku derê be, xwe lê cUgu-e. Mçriv jîbê quêj fl bê gemar çênabin!.. Ewqas sal çfln fl batin merivên Hed Gênc lê ne pu-sîn. Ne dbcwcstin rûçikê merivê kurdunde bibînînin, ditirsiyan ku bela wî U wan jî keve. Ê niha jî qirêj cU merselê de ye! Gava bihîstin ku merivê wan dikc bunire fl ji biU kevnejmekê kcsek ê U şûna warê wî nemîne, giştan xwe dan hev, yekî berî yê din xwest xwe bigêhîniyê. Çar pênc roj derbas ne bîin, qeflek merivên Hecî Gênc xwe dan ser hev fl batm U mala wî riîniştin, sec-tên jiyana wî dijmartin. Her yekî ji wan, tiştekan cU çav xwe rc kiri bûn. Hinekan çavê xwe berda bfln xanî, binekan perê liişk, hinekan dikan fl hebûn, tew binekan nêta xwe U jina wî jî xerab kiri bûn.

Du rojê mêvanan qediyân, Hecî Gênc dikira ji kêf û eşqa merivên xwc, ji nav Uvînên nexweşiyê rabflya. U kî (iizanc,

belkî rihet jî biba! Lê mêvanan ecele kir, U wan dereng kct.  
Hinekan hesabê xwe fl du sê rojan tenê kiri bûn! Rojekê veş-  
artin, yekê hejandina xêrê, ya sisya ji bona eyb fl arê dunyayê,  
(Uviya bû U şûna wî bimana û (U wê rojê de jî, tiştên nayên bU-  
103

gutin bifrotana fl vegcriyana mal.

Roja sisiyan, Mele Mchmed karê xwe û çîina mal kir. Bi  
laqercU ji Hecî re got:

- Birako, te çav U merivên xwc xist, ncmâ ê(U mirina tc  
beye, bi Xwedê tu roj bi roj U xwe zêdc (iUcî!

Birayê Hcd Gêncî yê mezin Xelo, wê çaxê bi qerfîgot:

- Mclê Mebmcd, ku nc ji te ba, bi Xwedê me rê jî ne diha-  
nî ser mala Hecî, dc ka ber cm batinc, em ê ^v jî bi hev rc  
şevbihêrka xwe bikin, heta sibê Xwedê mczin e!

Mele Mehmed qanî bfl fl wê şevê jî ma. Êvarê piştî şîvê,  
Hccî Gêncî, tc digot qey çavên xwc kil kiri bû, şewq ji dêmê  
vn (Uçû. Heta navê, (U bmê Uhêfê de, ji navê û berjor jî şip U  
qiin rûnişti bû. Bi mirîzekî xweş fl devUken bi mêvanan re xe-  
ber (Uda:

- Bi xêra hatina we û berketa dîtma wc, Xwedê hêzeke nû  
û teze xiste nav laşê min. Ewqas sal fl zeman biburî, me bev-  
du ne dîl. Kî (iizane, gelo beye carek <iin em hevdu bibînin  
yan na? Her hfln hatme, ez ê wesiyetên xwc U we bUcim. Scr-  
bilincUycke mczin bû ku hfln di Sf c sînoran re batin, we jiyana  
xwe xistc bin xcterê ku bûn min bibînin. Mervatî beqê we,  
bîin ji wir heta vir (U ser serê min re batine. Ez ê îro gotina  
xwe ya dawîn ji we rc bêjun! Mele Mehmed jî, ne xern> e, me

biçînkaniya xwe bi hev re qedan(Uye, ew jî weke pismamekî mcyê.

Do û î)êr ez bêkêf bûm, min nikarî bfl bi we re xeber bida, mm tenê U we guhdarî dUcu-. ŞUcu-, El-hemdfli UUah, bûn bûne eşîrek, balê we xweş e, gişt xwccU mal û jin û zaro ne. Lê yê min, Xwedê ev sosirmet bi serê min de anî. ŞUcir dîsa ji te re ya Rcbî, zu-iyeta me maye! -Hecî destê xwe ber bi jor vegul- Hecî Gêncî bebekî rawestiya, kesereke kîir kişand fl dîsa gotinên xwc bcrdewam kir:

- Mele Mehmedci, -berê xwe pê de kir- bêvî û rica min ji tc cw c ku tu wesîyeta nun U cem xwe bmivîse fl ji bîr neke! Mcle Mehmed bi teqU û (Ulovanî lê vegerand û got:  
- Tişt nabe Hecî, va ye komek merivên te rîniştine, Xwedê U ser her gotmeke te be, ew ê wilo bîn cî!

104

- Dc baş e, Mele Mehmed, merivno! Ez ê îro çîroka xwe ji serî de bêjun... ji scrî de: Seyro... Seyro... -Hed hêdîka ban kir- Rehme U bavê te, tu ê hebekî bi pêş de werî. -ZUaman tevde bi hev re gotin: Seyro, Scyranê, Rehme U bavê tc, tu ê dUê Hed nehêlî!- Seyro hat U nik Hed riinişt.

Hecî, wek yekî ku bemû bêza canê xwe fl baweriya xwc bi-de ser bev fl ^î têxc ser gotina xwe, got:

- Merivno... wesîyeta min U wc... Seyro, Seyro, Scyro... - Hebekî keloguî bû, keserekc kflr kişand fl pêde çû- Malê min... MUKê min... Jiyana min... dikana min... bertîştê min ji Scyro rc... bcrtiştê min... Hcrtişt!

Mêvan fl Mele Mehmed tevde ji darekê ketin! Xelo (U ber

dUê birayê xwe da:

- Hecî, çi qewimî ye, tu ecelê U xwe dikî. Em komek merivên te U te vehewiyane, Seyro namûsa me ye, em wê bi tu deran de bcrnadin!

- Na, na... buayê min! Pîrek darê şUcestî ye. Dunya gişt U alflid û Seyro U alflcî!

Mele Mehmed xwc xist nav peyvê:

- Heciyê delal, şerha Xwedê tiştê ne biştiye, her hesab tê de beye.

Hecî bi bêhnten^ lê vegerand:

- Amentû bfl-lah, lê tiştê cU navbera min û Seyro de, di navbera tu kesên din de ne buhuriye... Seyro ne sitewr e! Seyro hîna qîz e, qîz e... Seyro QÎZ E! Hîna min ew mar nc kiriyê... Hûn tê^hîştin, merivno, Seydayê delal?! Hemû malê min U Seyro helal û zelal be, ew çi dUce wê bike. Ew... çi... d...i...k...

Çavên Hecî zûq man vekirî, cU kortikên xwe de sar bfln... hustuyê wî xeUya, ket ser balgehê... Mu.

105

## XU-XIJONEKO

Mm bazirîya xwe dUcu- ku herim Yêrîvanê... Wê êvarê, ez bi tena xwe cU (xia xwe de rûniştî bûm. Hawirdorî min qaryolên vala ne, kaxezên kovar û rojnaman (U bundir de belawela ne. Ez (U xwe re nabûim ku wan bidim ser bev û bavêjim. Riiniştîme, mitalc (iikim, dcqan (Ujmêrun... wexta derketinê ê kengî bibe ku xwe bigêhînim trêne. Tiştê di bala min de time ji biU Yêrîvanê, «Rêya Tcze», «Ra*ii*yoya Kur(U)! Vê yekê jî,

ne (iihişt ez baş bala xwe bidim scr pirtik-mirtUcê dora xwe, wekc bi rflsî jî cUbêjin: «Hewasa mêvanan gu-êdayiyê çentan e».

Unîvêrsîtê kaxeza qebûlkirinê daye min: Divê ez mehekê sax, (U rojnama «Rêya Teze» de kar bUdm, wekî bêm junartin ku min ^praktflca xwe bi cî anî», lê ciUê min natebite: Meheke sax... perê kê... bajarekî nenas!... Erê, hat û ez U wir bê pere mam, wê çi bi serê min bê? Weha carina ji xwe re dibêjun û difUcU-îm. Mm bê sflc û sebeb ev karê zêde ji xwe re çêku-. Ma 106

min jî weke hemfl xwendevanan praktîka xwe (U rojnamcycke bajarê Moskvayê de bikira, nc çêtir bfl? Çi lazim e ev scrêş û ev dewxa ba?... Carina dUê min weha ji min re (iigot û ez kerr fl gêj (Ubiim... Lê kî yê vê besretê ji dUê xwe derxe? Kê ji min bêtir dbcwest kurdê Sovyetê bibîne, bi wan re bipeyive?... TcwkeU bi Xwedê, hema çi dibe bUa bibe! Bêjî serêşan û zehmetiyan dunya ji çi re yc?! Ji bcr van ramanan, bcrya ku ji mal derkevîm jî, min ji hevlekî xwe re U têtê xist, wî bcvaU bêhna min firc kir û bi bawerî ji min rc got:

- Xeman nexwe, beger tiştê ji bo tc pêwîst be, ji min rc U têtê bbcc, an jî namekê bişîne, cz U ber te me!

Dawiya êvarê, cn^i^a min bat birîn. Ncma tu fikran dikim.

Mm bUêta xwc berî rojekê kirî bii, ketun trêne, tu U ku fl Yê-rîvan U ku! Rê dirêj c, ji Moskvayê beta Yêrîvanê nêzikî 70'ê seetî dom dike û sefer jî zehmetî ye, lê xweş e.

Çend seetên pêşîn derbas bîin, hêcU hêcU bêhna min vecU-bû. Min çend merivên dora xwe nas kir, bi wan re ketun gotm



fl galegalê. Puaniya wan ji bajarê Yêrîvanê bfln, ji min re behsa dîroka bajêr, jiyana wî ya teze, comercUya binêlê wî û sipehîbûn û xweşikbîna avahiyên vn dikirin. Gotinên wan merivan, hinek fort fl payebûn jî tê dc hebîi, lê dihiştin ez bi-  
<iim ber bev, du şiklê rcngoreng: Şiklê Yêrivana birîndar mişt kul fl xem di dîrokê de fl şiklê wê yê teze ku min hîna ne dî-  
tiye; yê weke (U pesnê dengbêjê kurd de, Aramê Dêkranê ku bi xwe ermenî ye, cUbêje: «Gul şêrînê Hayestanê, biika salê Yêrîvanê».

Di trêna dc wext giran cUUviya. Min fl xelkê bi min rc, mc cU oda fargonê de wext bi pirs fl bersivan derbas dikir. Mc sc-  
rî ji hev kiri bû, lê em ji gotinên hev têr nc cUbiin. Wan ji min, U ser jiyana ermeniyên welatê me (iipirsîn, min jî U ser kurdên Ermenîstanê. Gava cUbf l wexta xewê, me şevxweşî U hev dikir, ronahî vedimirand, lê xewê zû bi zû nc cUgut ser çavê min. Tim û tim (U mitalan de me... Seetekê berî seetekê bigêhêm Yêrîvanê, redaksiyona «Rêya Teze» bibînim, xwe bi cî bUcim û serikî jî bidim RacUyoya kurdî!

Evara dawîn, rê gelekî bi min tade hat. Ez qerimî bûm, ço-  
107

gên min ncma di^uxulîn. Mc nê^îka^ U Yêrîvanê dikir, lê bî-  
ranînên dûr fl kflr nav cergê min dc ciikewgirîn, weke ^qe-  
^qa lingên trêna ku (U bmê me de, tiştê dûr û nêzik digêh^e  
hev, wê bîranîna min jî (iihişt ku ez dîr û nê^ bifikirim:

\*\*

Di pêşiya dchsalên 60î dc bfl. Ez wê çaxê biçîik bflm, şeş  
heft saU bflm fl racUyoya tranzîster U gundan pu- kêmbiîn. Li

gundê me yek tenê hebû. Carekê, êvarê, bîna tarî baş ne kcti bû erdê, gun(Uyên me U dora wê tranzîstorê (aviya bîin, U ra-(Uyoya Yêrîvanê guhdarî (iikirin... Geb sitran, geb axaftin... heta kutasî bat. Gava spflcerê racUyoyê gotinê xwe yên dawî gotin: «Programa me îro xelas bû, de ma xatirê we!», gimcU bi carekê rc kirtînî ji wan ne hat. Heger te dera bavêta, ew ê dengê wê bUiata. Her yek ji wan di ciyê xwe de meUsî fl cU ber xwe de difikirî, heta yekî bi pirs û kenê xwe ew bêden^ buî:

- Hfln ji min re nabêjin gelo, ev bêbav çawa giyaye wan derina?

Berê tu kesî deng ne kir, lê te cUgot qey xortekî bi xwe naxwoş anî. Wî bi hêrs got:

- Apê delal, ev merivê ku (U ra(Uyoyê de (Upejivî, ne bêbavekî ji van deran e, ew ne ji Qanişloyê ye, ne ji Amûdê ye. Cî û warê v\î, wir e; ew U wir çêbûye, U wir mezin bûye fl U wclatê xwe (U radiyoya xwe de kar dike. Kurd U Ermenîstanê û U Sovyetîstanê gelek m, ew U wir zunanê xwe dixwînin, pu-tûkên (Ubistanê bi zimanê wan derdikevin!..

Hîna yê xort gotina xwe ne bUi bû serî, zUamekî din pus ku-:

- Gelo bûn ji min re nabêjin, ew jî weke me musulman in, yan kafir in?

Diyar bû ku xort nikarî bû bersiva wî bida, wî devê xwe tev bu- û anî, lê yekî din gotm ji ber girt û got:

- Kuro, çima we bi serê bev girtiye fl hîin (Ukevin qirika hevdu? De ka werm vê xij-xijoka radiyoyê bişkînin û ji mêrUc bipû-sin, bê ew ji kuderê ye, çi eslê wî ye, musulman e yan kafu-e?

Ji nû ve bû bêden^... tc cUgot qey binekan yeqîn kir fl bi-  
108

nekan ne kir. Lê yên ku yeqîn ne dikirin, mecalên wan tune bûn, nikarî bfln gotinên xwe bi ca fl war bikin. Wê çaxê yê xort, qeberî, bi xeyd rabfl ser xwe, dev ji civatê geriya û çû. Gun(Uyan wê rojê qirik U bev qetandin. Her yekî ji wan tiştck (Ugot: Hinekan (iigotin: Dengê wî weke dengê filankesê, filankeso ye, yê ku bîn û berata wî ji zfl de qut bflye; fl hinek jî, her U ser ya xwe man fl (Ugotin: Evana, miheqeq şeytanên biçîik in û (U van sindoqên biçûk de dikin xijexij; geh dikenin, geb (Ugirîn, geb distirên fl (Upejivin! U ji ber vê yekê, guhdariya wan jî heram e!

Ez jî wê çaxê biçûk bûm, min çî bibihîsta, dbdst serê xwe; lê piştî wê (nvatê min guhê kalikê xwc qul kiri bû. Gav û scct min jê pû-s dikir. Li ser van kesên cU raciiyoyê de cUpeyivin. Tim jî, min jê dbcwcst ku min bibe cem radiyoyê, U sitranên kurcU guhdarî bikim. Carekê wî bi benekî ji min re got:  
- Emir qesifyo, xij-xijoneko! Ev calê we, bûn mezin bibin, hûn ê dunyayê U ser serê mc xera bikin... Tu wUo (iistirê, ba-wê ra(Uyoyê <iibêjî, ez (Utirsim tu mezin bibî, tu ji dcst me derkevî, bigêhêjî van bê îmanên ku di radiyoyê de (Upeyivin. Erê... Wê çaxê ez biçflk bflm, min nizanî bfl meriv çawa bikari be here welatê ku bi kurmanciya sor (U ra(Uyoyê de (Ustirên, (Upeyivin, bcnekan dikin... Ma kê wê çaxê dizanî bû ku cw ê qismetê min çê bibe û cz ê wan deran bi çavê serê xwe bibînim?... Lê va ye ez U ser rê me... derim Yêrîvanê... dyê xij-xijoncka ku xeyala min bi demeke dirêj U ser qut ne (Ubû.

\*\*\*

Roja sisiyan ji seferê, ez gêb<sup>^</sup>tim Yêrîvanê. Pêre jî, benê endîşa min bat birîn û rawcstiya. Hinek ji meremên min batin d. Pirsu ku pê hati bûm jî, Xwedê U hev anî. Min bi dcban xort û keçên kurdên Sovyetê jî nas kir. Li gundên wan geriyam. Min nasiya xwe da gelek şair, nivîskar, rojnemcvan, zana û ronakbîrên kurd, yên ku şopa xwc U ser ruyê çand fl wêjeya kur(U hiştinc. Dostê min çêbîin, (U ra(Uyoya Yêrîvanê de jî. Wan dostan carekê ji min xwestin ku dîtina xwe ya U ser Yêrîvanê, ji guhdarên radiyoyê rc bi lêv bikim, min jî qebûl kir. Gava U ber mflcrofonê riîniştim, min kesereke kûr kişand...

109

û (Ube ku hinckan ji karkerên ra(Uyoyê, wê çaxê bi manake (iin fêm kirin, lê min wê çaxê gotinên kalikê xwe anîh bû-a xwc: «Emir qcsifyo, xij-xijoncko!» û hema tune bfl ku kela (ii-lê min, bi hêsrên der biba, lê ji şermê, min xwc girt. Min qoziya çavê xwc paqij kir û dest bi gotina xwe kir: «Êvara we bi xêr û dcma we xweş be geU guhdarên hêja û delal! Ez fUan-kes im, (!) ji Glan gundî me... Gelek sUavê min U we bene... Ez sUavê xwe (iişînim ji dê û bavê xwe re... Ev der Yêrîvan e... Gclckî xweş c!... De ma xatirê wc, heta dîtineke nêzik!\*

Min gotina xwe xwend lê dUê min ne tebitî, gelo beyc hinckan ji guhdaran sUava min venegerand fl texmîn kirin ku ez jî «Xij-xijonckek im cU racUyoyên wan dc fl wan dixapînim?!»

110

REDWANÊALÎKÎYE

Redwanê AU, di sala 1955an de U Cizîra bmxetê ji cUya xwe (Ubc. Heta sala 1972an xwendina xwe ya pêşîn û lîseyê <like. Dûrc sê salên (U navbera 1973-1976an de ji alîkî ve U Ûnîyersîta Şamê, beşa Huqûqî dixwînc û ji aUyê <iin vc jî mamostetiya dibistanên hinek gimdên Ciniê dikc.

Piştî demckê (Uçc Yekîtiya Sovyetiyê û U wir şeş salan 1977-1983 U Moskvayê, FakîUta Rojnamevaiuyê dbcwîne fl bi awayekî serbilincU diploma xwe ya rojnamevaniyê bi dest xwe dbce.

Heta sê salan jî 1983-1986

cU warê rojnamevanî fl

torevaniya kurdî de xwendina xwe ya doktoratîyê dike.

Piştî doktora xwe ya rojnamevanî û torevaniya kurdî, Dr.

Redwanê AU ji sala 1987an fl vir dc U Fransayê (Ujî. Kar û xebatên ku Redwanê AU (U warê çand û torê de kiriye, nc hindikin:

Ji

dîroka

pêşveçflna

rojnamevaniya

kurcU

(teza

\*

doktorayê) 1986, bi zunanê ûrisî.

\* Cîgerxwîn, neynUca jîyana gelê kurd e, (birişflr) 1986, bi zimanê erebî.

Pu-tûka Zmar SUopî (Qedrî Cemfl Paşa),

«Fî scbfl

\*

Kurdistan» ji zimanê îirisî werg erandiye zimanê erebî 1987.

Weşanên Welat

Pirtûkên ku derketine

KEÇA KAPÎTAN

A. Pûşkîn

roman

\*

MIRINA KARMEND

A. Çêxov

kurteçîrok

\*

ARDÛ

kurteçîrokên gelêrî

Nivîsende: Hesenê Metê

Pirtûkên dê derkevin

MERIVÊN REBEN

F. Dostoyevskî

roman

\*

SMIRNOFF

Hesenê Metê

Kurteçîrok

WEŞANÊN WELAT

Wan e ew xelkek in û zimanê wan hemûyan yek e, û

tiştê ku ew dixwazin bi ser kevin jî ev e; ji yir ii weha her

çi tiştê ku wan dil faebe îî bikin, bila rê li bei- neyête

girtin.

Werin, em dakevin, ji bo ku ewserwextî ziraanê  
hevdu nebin, li wir em zimanê wan tev li hev bikin. v

TEKVÎNili6-7

## TÛRIKÊ ÇÎROKAN

Dilazad ART

ZANINGEH

ENQERE 2015/6

ÇÎROKAN TÛRIKÊ

Dilazad ART

ZANINGEH

ENQERE 2015/6

Hemû mafên pirtûkê ji aliyê nivîskar û weşanxaneyê ve hatine parastin.

Bêdestur bi ti awayî hemû pirtûk kopî nabe û belav nabe.

Bi awayê ku çavkanî were nîşankirin, hûn dikarin ji ber bigirin.

Edîtor

◀ Ridwan Xelîl

Berg û Rûpelsazî

◀ Ridwan Xelîl

Redaktor

◀ Dilazad ART

◀ Mehdî Zana Karak

Şêwirmend

◀ Cuneyt Ewrereş

Pisporê Zanistî

◀ Gulîstan Azad

Wêne

◀ Aydan Arda

◀ Mübare Aba

Çapa Dîjîtal

ZANINGEH

ENQERA

6/2015

TÛRIKÊ ÇÎROKAN

Dilazad ART

Zaningehe: 28

Kurdî: 15

Ji bo Pêwendî, Pêşniyaz,

Rexne û alîkirinên We:

Dilazad ART

24 53 235 505 0

dilazadart@gmail.com

dilazad.wordpress.com

Ridwan Xelîl

33 61 638 505 0

ridwanxelil@gmail.com

ridwanxelil.wordpress.com

Zaningehe

zaningehe.net

zaningehe@hotmail.com

Navnîşana Dabarkirina Pirtûkê

<http://www.zaningehe.net>

JIYANNAMEYA DILAZAD ART

Li ser çand, huner û wêjeyê dixebite. Nivîs, helbest û lêkolînên

nivîskar ên bi Kurdî û Tirkî di kovar, rojname û malperên cihe cihê



de tîn weşandin. Di bin sîya Zaningeh Mediyê de lêkolînên kurdewar, xebatên dokumenterî, klîp û filmên kurt amade dike.

Tevî zimanê zikmakî (Kurdîya kurmancî) bi zimanê Tirkî û Îngilîzî jî dizane.

Berhemên Dilazad A.R.T.

Kurdî

- 1Destana Evînê, 2010
- 2Ramanên Azad, 2010
- 3Tûrik, 2011
- 4Winda, 2012
- 5Lêkolînên Kurdî | fasîkul I
- 6Lêkolînên Kurdî | fasîkul II
- 7Tûrikê Çîrokan 2015/6

Wergerandin

- 1Rîsala Aborîye, 2010
- 2Wateyên 12 Suretên Qur'an a Pîroz, 2011

Tirkî

- 1Nûpelda'ya Ağıt, 2001
- 2Taşa Yazı Yazmak, 2010
- 3Kurşunlar Yürek Ağlattı, 2011
- 4Yolcu, 2011
- 5Şagird, 2012
- 6Başkaldırı Şiirleri, 2012
- 7Dijle'nin Çocukları, 2012

3

PÊŞGOTIN

Bi slavên germ...

Bi berhemeke nû, bi awayekî nû em li peşberî we ne. Tûrikê

Çîrokan.

Em zanin ku li ser folklor û kelepura Kurdan gelek berhem hatine nivîsandin nemaze li ser çîrokên gelerî berhevokên ji hev hêjatir ji aliyên zimanhezan ve hatina amadekirin. Lê ev xebatên li ser zimanê me yê şêrîn li gorî hin xebatên li ser zimanên biyanî yên ku serjimara axêverên wan ji kurdî gelekî hindiktirin, kemtir e. Divê em ji bîr nekin ku ji ber tundî û zilma lê hatiye kirin xêr û başiyêke herî balkêş ya di salên dawîn de xwedî derketina zimanê kurdî ye. Di vî warî de em kêfxweş in ku wek koma zanîngê û wek xebatkarên zimanê xwe, em jî bahra(par) xwe dixina nav ve kahnîya xêrê ku em hêvî dikin ev kahnî ti carî neyê çikandin û her roj bêhtir avê bi herikene. Ji bo ku zarokên Kurdistane ti carî tî nemînin...

Bi hêvîya gelek berhemên xwedî bingeha kelepura Kurdan...

Li ser navê

Weşanên Zanîngê

Ridwan Xelîl

4

Ev pirtûk

diyarî hemû zarokên Kurdistanê ye

ku ji çîrokên kelepura xwe dûr ketine

....

5

Naverok

ZÊRKA ZÊRAN.....7

ÇAR HEYWANÊN DI BÎRÊ DE ... 13

ÇÛK Û PÎRÊ ..... 18

ÇÊLÊKA ZER..... 22

6

ZÊRKA ZÊRAN

Hebû nebû

carek ji caran

rehmet li dê û bavê

hazir û guhdaran

\*\*\*

Zêrka Zêran hebû. Rojek ji rojan Zêrka Zêran  
û hevalên xwe diçin qirşika. Zêrka Zêran qirşikê  
xwe didêhev. Duvre ji hevalê xwe re dibejê:

-Min qirşikê xwe danehev. Heta hûn qirşikê  
xwe bidinhev ezê razim. Dema ku we karê xwe  
xilaskir min şiyarbikin. Ê dî emê bihevre biçin  
malê.

Zêrka Zêran li bin sîya darekê xwe direjdikê û  
di xewve diçê. Piştî ku hevalên Zêrka Zêran qir-

7

şikê xwe didinhev diçin malê. Li bin sîya daran  
Zêrka Zêran jibîrdikin.

Duv demekê direj Zêrka Zêran şiyardibê. Li  
dora xwe dimeyzênê, tu kesî nabînê. Ne mirov  
û ne ti sewal xuyadikirin. Zêrka Zêran bi tena  
serê xwe mabû. Rêya male jî nedizanî. Ji neçarî  
di reyêkê de meşî. Hirçek derdikevê hemberê  
Zêrka Zêran. Hirç ji bo ku Zêrka Zêran bixapîne  
dibejê:

-Ez dayika te me.

Zêrka Zêran dibejê:

-Pelava dayika min keske, desmala we sipîye  
û bi şalwar digere.

Hirç ji gotina xwe navegerê. Zêrka Zêran ji  
hirç re dibejê:

-Min rêya xwe şaşkiriye. Bi xêra xwe min  
bigihijêne mala bavê min. Duvre tu çi bixwazê  
ezê bidim te.

Hirç di dile xwe de dibejê:

-Ez li ezmana li te digerîyam tu li erdê hatî-  
ye berdestê min. Ezê çawa te berdim.

Hirç bi zorê Zêrka Zêran dibê şikefta xwe.

Zêrka Zêran dibêjê:

8

-Ez Zêrka Zêran bûm,  
Keça bavê xwe bûm,  
Xwişka heft bira bûm,  
Îro girtîyê hirçêkî har im.

Zerka Zêran ji neçarî li ba hirç dimenê. Dibe  
kevanîya hirç.

Piştî gelek sala dudo zarokên Zêrka Zêran  
çêdibin. Navê yekî Îsa, navê ê dîn Mûsa dideynin.

Rojekê Zêrka Zêran ji xwe re li zozana  
digerê. Dibînê ku şivanek li zozana pezê xwe  
diçêrê. Ji dengê şivan têdigihejê ku ev şivanê  
mala bavê we ye. Ji şivan dipirsê:

-Ma tu ne şivanê bavê Zêrka Zêranî?

Şivan bersiva Zêrka Zêran didê:

-Belê, ez şivanê bavê Zerka Zêran im.

Zêrka Zêran dibejê:

Ez Zêrka Zêra me,

Xweha heft bira me,

Girtîka hirça me,

Dayîka Îsa û Musa me.

Lê belê di dile Zêrka Zêran de şek çêdibe. Ji şivan bawernake. Ditirse ku şivan jî mîna hirç

9

wê bixapîne. Ji bo ku ji şivan bawerbikê ji şivan dixwazê ku ji heft gunda heft qinaba/kindira bênê. Şivan bi lez tê gund. Buyerê ji bavê Zêrka Zêran re dibejê. Bavê Zêrka Zêran ji heft kurê xwe re dibejê:

-Her yek ji we herin gunde xwe kindirekî benîn.

Birayê Zêrka Zêran diçin ji gundê xwe heft kindira tînin. Kindira didin şivan. Şivan diçê cihê ku Zêrka Zêran lê dîbû. Heft kingira şanî Zêrka Zêran dikê. Zêrka Zêran ji şivan bawer dikê û bi şivan re diçê. Her dû zarokê xwe li wir dihêlê. Piştî demekê hirç tê şikefta xwe. Her dû kurê xwe dibînin. Lê Zêrka Zêran nexuyaye. Ji zaroken xwe Zêrka Zêran dipirsê. Zarok dibejin:

-Dayîka me çû mala kalkê me. Yê ji me re hêka benê.

Ji hersbûnê hirç dirajê Îsa û Mûsa. Her dû zarokan li zinarê şikeftê dixê. Bi wî awayî her dû zaroken xwe dikujê.

Dema Zêrka Zêran tê malê gelekî kefa dê û  
bav û birayên we tê. Zêrka Zêran bê çi hatibû  
serê we yek bi yek ji malbata xwe re dibeje.

Bavê Zêrka Zêran dibejê:

10

-Keça min em gelekî li te gerîyan. Me ti çol û  
zozan û çiya nehiştin. Lê me ti şop ji te nedît.  
Şikir ji Xwedê re îro tu hatî mala xwe.

Bav û birayên Zêrka Zêran ji bo ku heyfa xwe  
ji hirç bistenin lihev civîyan. Heft birayan biryar  
dan ku bi heft derba wî hirçî bikujin. Roja dî  
heft birayên Zêrka Zêran xwe ji bo kuştina hirç  
amadekirin. Tîr û kevan û rime xwe saz kirin û  
ketin ser reya şikefta hirç.

Dema hatin ber şikefte ditin ku wa ye hirç li  
ber şikefteye. Birayê mezin bangî hirç kir:

-Hirço hirço, îro roja heyf standineye. Em  
heft birayên Zêrka Zêran'in. Em hatina heyfa  
xweha xwe. Were xwe berde meydana şer. Em  
bibînin ki mêr e kî tirsoneke.

11

Hirç bi awayeki ji xwe bawer tê meydana. Du  
birayên Zêrka Zêran du tîran li çavên hirç, du  
tîran li destên hirç, du tîran li pîyen hirç û rimekî  
jî li dile hirç dixin û hirç dikujin.

Piştî ku heyfa Zêrka Zêran hate standin bavê  
Zêrka Zêran, Zêrka Zêran bi şivanê xwe re dizevicenê.

Bi wî awayî Zêrka Zêran û şivan gihaştin

miradê xwe.

Kesên ku bêbext bê yê bêbextîye bibînê.

Çîroka me li diyaran,

Rahmet li dê û bavên guhdaran,

Ji xeynî şeytanê qûlên dîwaran.

12

ÇAR HEYWANÊN

DI BÎRÊ DE

Hebû nebû

carek ji caran

rehmet li dê û bavê

hazir û guhdaran

\*\*\*

Di demeke gelekî kevin de rovîyek hebû. Rojek ji rojan dikevê hundirê bîrekê de. Piştî ku gelekî ma rojekê gurek tê serê bîrê. Li hundirê bîrê dimeyzênê û dibînê ku rovîyek di hundûrê bîredeye.

Rovî gur dibînê. Rovî bangî gur kir:

13

-Tu li wir çi dikê? Beredayî digerê. Ez dizanim a niha tu birçî jî bûye. Di hundirê vê bîrê de kerîyek pez heyê. Ez çiqas dixûm xilasnabê.

Ev gotinên rovî girîz ji devê gur anî xwarê. Gur ji rovî bawer kirîye û xwe berdaye hundûrê bîrê. Gur dimeyzênê ku ne meh hene û ne bizin hene. Dibejê:

-Kanî kerîye te digot.

Rovî dibêjê:

-Min henek li te kir. Ma çi karê pez li wir heyê.

Piştî demekê kerek hatîye serê bîrê. Dibînê ku di hundûrê birê de rovîyek û gurek heye. Rovî û gur bangî kerê dîkin. Dibejin:

-Hey kero! Li vir zewîyeke meyî ce heye. Ger tu jî werê emê wî ceyî li xwe parkin.

Navê wî li serêye. Ker ker e. Heman ji wan bawer dikê û xwe diavêjê bîrê. Di bîrêde tiştêk xuyanakê.

Ker dipirsê:

-Kanî ceyê ku we digot?

Rovî û gur pê dikenin. Dibejin:

-Hey kero ma zewîya ce li vir çi dikê?

Piştî demekê kiroşkek tê serê bîrê. Dibînê ku rovî û gur û kerek dibînê bîrêdene. Kiroşk ji wa dipirsê:

14

-Hûn li wir çidîkin?

Her sê heywan dibejin;

-Li wir bexçê gêzer û xasa hene.

Kîroşkê jî ji wa bawerkir û xwe avêtê bîrê.

Kîroşk ti tiştî nabînê. Ji wa dipirsê:

-Kanî ew bexçê ku we digot?

Her sê heywan dibejin:

-Me henekê xwe bi te kir.

Vê carê her çar heywan di hundûrê bîrê de rawestiyane. Her çiqas rawestane ti kes bi ser wa de nehatîye û bi wî awayî hefteyek derbaskirine.

Ew maye ku ji nêza û ji birçîbûna bimrin. Rovî ji gur û ji kerê re dibejê:



-Ka em kiroşkê bixin.

Ev pêşnîyara rovî dipejirenin û kiroşkê dixûn. Lê goştê kîroştê ûrê wan têr nekir. Bi zorê hefteyeke debara xwe kirin. Duvre disa pirçîbûne li serê wa xist. Rovî bi awayekî bêdeng diçe bal gur û ji gur re dibejê:

-Tu biya min bikê emê kerê bixun. An emê ji birçîbûna bimrin. Gur ji birçîbûna fikrê rovî qebulkir. Biryara xwarina kerê dan. Rovî û gur bihevre erîşî kerê kirin û ker xwarin. Rovî hîlêbaz bû. Her çar linge/pîye kerê ji xwe re hilandin. Gur têr xwar. Heftek derbasdibê. Tu kes bi ser wan de nehatiye.

15

Rojekê dengê ji rovî te. Gur sedema wî dengî dipirsê. Rovî dibejê:

-Ez ji birçîbûna linge xwe dixûm.

Gur ji rovî bawerdikê. Gur jî dirabê û lingê xwe dixwê. Piştî demekê dengê dî ji rovî tê. Gur sedema wî dengî dipirsê. Rovî dibejê:

-Ez her sê lingê xwe dixûm.

Gur ji rovî bawer dikê û her sê lingê xwe dixwê.

Piştî demekê rovî tê ba gur. Gur dimeyzênê ku her çar lingê rovî pêvene. Gur femdikê bê çî hîle hatîye serê wî lê êdî tiştek ji destê wî nayê. Rovî bi vê dekê gur jî dixwê. Piştî ku rovî gur xwar halo dia/lawa dikê:

-Ya Xweda ye min ku ez ji vir derkevim, ezê mewlûdeke bidim.

16

Piştî vê lawayê bahozek dirabê û hundûrê bîrê  
tijî qirşik û darik dibê. Rovî pel qirşik û darika dikê  
û xwe hildikişê devê bîrê. Rovî bi vî awayî ji bîrê  
rizgardibê. Piştî ku ji bîrê derdikevê dibejê:

-Vaye ez ji bîrê xilasbûm ne hewceye mewlûdê  
bidim.

Piştî vê gotinê bahozeke dî derdikevê û dîsa rovî  
dikevê bîrê. Dîsa lawa ji Xwedê dikê. Tofanek çêdibê.  
Rovî hevî dikê ku dîsa ji bîrê derkevê. Bi tofane  
re lateke mezin digindirê binê bîrê. Çermê rovî di  
binê bîrêve dibê yek.

Kesên ku li gotina xwe xwedî dernekevê dibin  
barê gotina xwe de dimênê.

Çîroka me li diyaran,  
Rahmet li dê û bavên guhdaran,  
Ji xeynî şeytanê qûlên dîwaran.

17

ÇÛK Û PÎRÊ

Hebû nebû

carek ji caran

rehmet li dê û bavê

hazir û guhdaran

\*\*\*

Carekê ji caran pîrekek hebû. Rojekê ji roja mevanên  
pîrekê ten. Ji bo ku nanê xwe bi tenûrê  
wekê, hatibû serê tenûrê. Hundure tenûrê tijî  
qirşik û darik û ardû dikê lê tenûr pênakevê. Çiqas

pifdikê tenûrê tenûr pênakevê. Çûkek tê xwe le ser tenûrê dideynê. Çûk dibînê ku pîrê çî dikê nakê nikarê tenûrê pêbixê. Çûk dibejê pîrekê:

-Wa pîrê, wa di pîyemînde sitirî hene. Ger tu van sitirîya ji pîye min derxê û bixê çavîya tenûra xwe, yê tenûra te pêbikevê.

18

Pîrê biya çûk dikê. Sitirîyan ji pîye çûk derdixê û dixê çavîya tenûrê. Tenûr pêdikevê. Pîrê nanê xwe bi tenûrê ve dikê. Dema ku pîrê nan xilaskir çûk bangî pîrê dikê:

-Wa pîrê!

Pîrê dibejê:

-Çiye?

Çûk dibejê:

-Pîrê ya tê sitirêyen min bidê min an tê heft nan û qursikekê bidê min an jî ez bela xwe ji te venakim.

Pîrê ji bêçaretî heft nan û qursikekê didê çûk. Çûk ji wir difirê diçê digihêjê şivanekî. Dibînê ku şivan mîrok û kêzika û rîx û pişkûla dixê nav şîrê xwe de. Çûk ji şivan re dibejê:

-Wa şivano! Wî şîrî birjêne û şîrnî nû bidoşe. Va nanê germ û qursikê germ li ba min heyê. Emê bi şîr re bixûn.

Şivan bîya çûk dikê. Piştî ku bihev re xwarin xwarin çûk dibejê şivan:

-Şivano ya tê heft meh û beranekî bidê min an

tê nanê min û qursikê min bidê min. Tu nedê min ez bela xwe ji te venakim.

Şivan ji bêçaretî tiştê ku çûk dibejê dide çûk.

19

Çûk ji ba şivan difirê diçê li hemberî dawetêkê tê. Çûk dibînê ku her kes ker û bergîl û kuçik û pisîka digurenin. Çûk ji wa re dibejê:

-Dev ji wa berdîn. Wa li ba min heft meh û beranek heye. Ger ku hûn bixwazin ezê van meh û beranê xwe bidim we.

Dawetvan gelekî kefxweşbûn. Meh û beran gurandin û kelandin. Dawetvanîya xwarina xwe xwarin.

Duvre çûk dibejê:

-Ya hûn heft meh û beranê min bidin min an hûnê bûkê bidin min'.

Ji neçarî bûkê didine çûk.

Çûk bi bûkê re diçê digihêjê gavanekî. Dibînê ku bilûra gavan heye. Ji gavan re dibejê:

20

-Gavano ger tu wê bilûra xwe bidê min ezê vê bûkê bidim te.

Gavan li çî digere. Hemen bilûrê didê û dirajê bûkê.

Çûk bi bilûra xwe diçê ser hêtekî/dîwarekî xanîyekî ketî. Li bilûrê dixê û bangdikê. Dibejê:

-Ji wir û ji vir kî wek min heye. Min sitirî dane bi heft nana, nan dana bi heft meh û beranekî, meh û beran dana bi bûkekê, bûk da bi bilûrekê û ana li

ser vî hêtî li bilûra xwa dixim. Ma kî wek min jêhatî heye?

Çûk ve gotinê sê cara dibejê. Dema ku çûk bi wî awayî dixwenê hêt dibin çûk te tê hêrivandin û çûk dibin hêtê ketî de dimirê.

Bitrîtî ji gayê cot re jî namê nê.

Çîroka me li diyaran,  
Rahmet li dê û bavên guhdaran,  
Ji xeynî şeytanê qûlên dîwaran.

21

ÇÊLÊKA ZER

Hebû nebû

carek ji caran

rehmet li dê û bavê

hazir û guhdaran

\*\*\*

Keçikek hebû. Navê wê Eyşêbû. Di piçûkatîya we de dayîka we mir. Çêlekeke wa hebû, ji ber ku bi şîrê wê mezinbûbû jê re digot dayê. Bavê keçikê jinek ji xwe re anî. Keçikeke wê jinikê jî hebû. Jinbavê ji keça xwe gelekî hez dikir. Hemû karê giran bi Eyşê dikir. Ti hevalê Eyşê nebûn ji çêlêka zer pêve. Jinbavê ji bo çêrandina çêlêkan Eyşê dişiyand zozana. Dema ku Eyşê diçû ber çêlêka jinbava vê ta û singig didanê û digot ji me re fanêre çêbike. Çêlêka zer, çêlêkên dî diçêrandin û Eyşê bi ta û singig fanêra dihûnand. Her roj fanêrek dihûnand. Jinbava wê çavnebarî lê dikir.

22

Rojekê dibêjê keça xwe dibejê tu here ber çêlêkan.  
Keça jinbavê çû ber çêlêkan. Dest bi hûnandina fanêra kir. Dema ku çêlaka zer dît keça jinbavê dest bi fanêra kir erîşî çêlêkên dî kir. Berê her çêlêkekê dida deverekê.  
Keça jinbavê heta evarî çêlêk bi darê zorê kom dikir. Êvarî bi girî hate malê. Hê rêzek ji fanêrê xwe çênekiribû. Dayîka wê jê dipirsê:

-Çîma te fanêrê xwe çênekir?

Keçik dibejê:

-Çêlêka zer da pey çêlêkên dî. Heta min êw gihandin hev bû êvar.

Jinbav dîsa dihêlê ku Eyšê herê ber çêlêka. Rojekê bi dizîka li pey şopa Eyšê diçê. Ji bo ku raza vî karî fembikê. Dibînê ku dema keçik dest bi hûnandina fanêra dikê çêlêka zer çêlêken dî didê çêrandin. Ev bû-  
yer gelekî li zora jinbavê diçê. Ji ber vena jinbava wê ji Eyšê heznedikir. Bi hêrs tê malê. Jinbava keçikê rojeke xwe nexweş dikê û ji mêrê xwe re dibejê:

-Ez nexweşim. Dilê min diçê goştê çêlêka zer.

Merik dibejê:

-Temam emê ji bo te çêlêkeke dî bigurenin.

Jinik dibejê:

-Na. Dibê goştê çêlêka zerbê.

Merik dibêjê:

-Tu dizanê keça min pirr ji wê çêlêkê hezdikê. Ezê ji

23

te re çêlêkeke dî bigurênim.

Jinik ya xwe bi ser ya mêrê xwe dixê. Merik ji bê-

çaretî daxwaza jina xwe bi ceh tênê. Ji bêçaretî merik  
bîya jina xwe dikê. Keçik ji bo vê biryarê gelekî xemgîndibê  
û digirî. Keçikê digot:

-Çima hûn dayîka min dikujin?

Çêlêke ji keçikê re got:

-Dema ku jimbava te goştê min bixwe yê tamake  
nexweş û tahl jê werê û dema ku tu bixwê yê tameke  
gelek xweş jê werê. Dema ku te goştê min xwar  
hestûyen min neavêje, li devereke zevîye veşere.  
Dema ku ji te re pêwîstbû were derxe, tiştê ku tê  
bixwazê yê ê biceh.

Rojekê li gund daweta kurê mîr çêdibê. Jinbav û ke-  
çika xwe diçin dawetê. Eyşê li malê dihêlin. Eyşê diçê  
nav zêvîye hestîye çêlêkê derdixê. Dibîne ku hemû  
hestî bunê cilên zêr. Cilên xwe li xwe kir û pêlavên xwe  
li pîye xwe kir û çû dawetê. Keça jinbavê ji dayîka xwe  
re dibêjê:

-Daye ev keçik çiqas dişibihê Eyşê.

Jinbav dibêjê:

-Ew ji ku halo xweşik û bedew tê.

Dema zava çav li Eyşê dikê dildikeve keçikê.

Dixwazê bi keçike re bizewicê. Hişê wî bi tev diçê ser  
Eyşê. Keçik piştî ku demekê li dawetê dimênê tê malê.

24

Li malê ji bo ku heywana avdê diçê ber bîrê. Dema ku  
xwe ditevênê ferek pêlava vê dikevê bîrê. Duvre jinbav  
û keça xwe ji dawetê tên malê. Dibînin ku Eyşê karê  
xwe dikê.

Rojekê kurê mîr tê serê bîrê ku hespê xwe avdê. Dibînê ku ferek pêlav dinav ava bîrêdeye. Wê fera pêlavê derdixê. Tê hişê wî ku ev pêlav ya keçika ku hatibû daweta wî. Kurê mîr dibejê:

-Ev pêlav li pîyê kê werê ezê pêre bizewicim.

Li her çar alîye welat digerê. Keçikê ku ve bûyêrê dibihîsin ji bo ku pêlav li pîyê wa werê tilîyê pîyê xwe jêdikin. Lê dîsa li pîyê tu kesî nedihat. Kurê mîr tê mala Eyşê. Keça jinbavê xwe didê pêş, pêlavê li pîyê

25  
xwe diceribênê. Çi dikê nakê pêlav li pîyê wê nayê. Di dawîde bangî Eyşê dikin. Jinbav û keça xwe ji vê bangê pirr acizdibin. Lê dema ku kurê mîr pêlavê li pîyê Eyşê digrê, dibînê ku pêlav tam li gora pîyê Eyşê'ye. Kurê mîr bivêna gelekî kefxweşdibê. Mîr tê keçike ji kurê xwe re dixwazê. Keçikê didine kurê mîr. Heft roj û heft şeva dawetê dikin.

Rojekê keçik tê malbavan. Jinbav dibeje:

-Ezê serê te bişom.

Eyşê dibeje:

-Ez mezin bûme, bi mêr bûme, tê çawa serê min bişo.

Bi zorê jinbav keçike dibê serşokê û serê keçikê dişo. Ji bedela şeh de pora keçikê bi derzîya dişkine. Xwîn ji serê keçikê diherikê. Keçik dibejê:

-Ya Xwedê xwezî ez bûbame çûkek û ji destê jinbava xwe xilasbûbame.

Wê kêlîke di bê çûk û difirê diçê baxçê mêrê xwe.



Mîrzade tê malbavana jina xwe ji jinbava pîreka xwe dipirsê:

-Kanî jina min?

Jinbava keçike dibejê:

-Ez nizan im.

Piştî ku mîrzade jina xwe nabînê, jinbava jina wî keça xwe didê mîrzadê. Eyşêya reben a ku bûye çûk

26

difirê te bexçe mîr. Dibînê ku bexçevan dara avdidê.

Çûk li ser darê bi baxçevan re diaxivê. Bexçevan tê

rewşa çûk ji mîrzade re dibêjê. Mîrzade dibejê:

-Herin wî çûkî benin.

Çûk ji bexçevan çakete wî dixwazê. Baxçevan çakete xwe didê û çûk tê xwarê. Çûk çaket li xwe dikê. Dema ku çakêt li xwe dikê dibê keçik. Baxçevan diçê rewşê ji mîrzade re dibêje. Mîrzade tê û digihejê pîreka xwe. Duvre jinbav û keça wê dikujin. Mîrzade û jina wî bi dilşadî jiyana xwe didomenin.

Ê ku bîrê ji bo hevalê xwe bikolê, berî hevalê xwe ew dikevê wê bîrê.

Çîroka me li diyaran,

Rahmet li dê û bavên guhdaran,

Ji xeynî şeytanê qûlên dîwaran.

27

28

Em zanin ku li ser folklor û kelepura Kurdan gelek berhem hatine nîvîsandin nemaze li ser çîrokên gelerî berhevokên

ji hev hêjatir ji aliyên zimanhezan ve hatina amadekirin. Lê ev xebatên li ser zimanê me yê şêrîn li gorî hin xebatên li ser zimanên biyanî yên ku serjimara axêverên wan ji kurdî gelekî hindiktirin, kêm e.

Divê em ji bîr nekin ku ji ber tundî û zilma lê hatiye kirin xêr û başiyeye herî balkêş ya di salên dawîn de xwedî derketina zimanê kurdî ye. Di vî warî de em kêfxweş in ku wek koma zaningehê û wek xebatkarên zimanê xwe, em jî bahra(par) xwe dixina nav ve kahnîya xêrê ku em hêvî dikin ev kahnî ti carî neyê çikandin û her roj bêhtir avê bi herikene. Ji bo ku zarokên Kurdistane ti carî tî nemînin...

Ridwan Xelîl

\*\*

## XWEYÎ Û XULAM

M. ELÎ KUT

çîrok

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 2

H. Tûmanyar

Xweyî û xulam

Werger: Casimê Celîl

Wien - 2012

Çapkîr Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

H. Tûmanyar: Xweyî û xulam

Werger - Casimê Celîl

Rêdaktor - Emînê Evdal

Nîgar - Nellî Caxînyan

Weşana pêşin - 1936 Rewan

Karê kompyûtêrê - Lûsîka Gêrman Mîzanpaj - Cemal Celîl (Alionis)

ISBN 3 - 902185 - 23 - 6

XWEYÎ Û XULAM

Xwedê xêr bike wera jî, herdu birara jî.

Dibin - nabin du birê kesîb dibin. Duşurmîş dibin, çi bikin, çewa bikin, ku mala xwe xwey kin. Qirar dikin, wekî birê çûk bimîne malê, lê birê mezin here cem dewletîkî bibe xulam. Xebat, heq bistîne, bişîne malêra.

Bi wa jî birê mezin radibe diçe cem dewletîkî, dibe xulam.

Wede kivş dikin hetanî bahareke dinê ku pûpû gazîke. Ew dewletî qirarekî nedîtî datîne pêşya xulam. Dibêje:

- Hetanî wî wextî, ku tu hêrs bibî

- tû hezar manat cirm bidî min, her kê ez hêrs bim

- ez bidim.

- Hezar manatê min ku tune, ez ji kîderê bidim, -xulam dibêje.

- Tişt nabe, bona wê tê mira deh sal bêheq bixebitî.

5

Kurik him ditirse ji wî qirarî, him jî duşurmîş dibe: yanê wê çi biqewime. Çi dixwezin bira bikin, ezim hêrs nabim, kuta bû çû. Lê wekî ewana hêrs bibin, bira ewana cirma qirarê xwe bikşînin. Dibêjê:

- Baş, ez qayîlim.

6

Qirar grêdidin û dikeve ser qulixê.

Rojtira dinê xweyî xulamê xwe sibê zû radike û dişîne zevîyê biçine. -  
Dibêje:

- Here hetanî ro ronayîye biçine, kengê tarî bû, were.

Xulam diçe ji sibê hetanî êvarê diçine, êvarê  
westîyayî tê mal.

Xweyî pirs dike: - Tu çima hatî?

- De ro çû ava, ez jî hatim.

- Na usa nîne. Min tera gotye, hetanî ronî-  
ye, tu biçine. Ro çû ava, lê binhêre hîva birê wê derket. Çima ew kê  
ronayî dide?

- Ew wê çewa bibe? - Xulam metelmayî dimîne.

Axa dibê - Tu hêrs dibî?

- Na ez hêrs nabim ... ez tenê dibêjim, ez westyayîme... min dixwest, ez  
hinekî rehet bibim ... Xulam xwe diqincilîne hev û dîsa diçe  
çinînê ...

Diçine, diçine, heta hîv diçe ava.

Lê hîv çewa ku diçe ava, pêra-pêra tev dertê.

Xulam qewat ketî, zevyêda vedileze.

- Wey, zevya te jî heram be, nanê te jî, heq dayîna te jî. - Guman lê birî  
dest bi çêra dike ...

- Erê, tu hêrs dibî? -Serra dewletî diseki-

7

ne, - De herkê tu hêrs dibî, qîrarê me qîrare. Êdî nebêjî, ku min bê qanûn  
şixul kir.

Û bi qevata qîrarê zorê lê dike. Xulam yanê hezar manat cirma wî bide,  
yanê jî deh sal bêheq bixebite.

Xulam di nav agirda dimîne. Hezar manatê wî tune ku bida, ruhê xwe aza  
bikra, deh sal jî meriv nikarbû cem merîyê wa xebat bikira. Difikire,

difikire û axirîyê berat dinivîse bona hezar manat deynê xwe, dide dewletî û por, poşman vedigere tê mala xwe.

- Hi, te çi kir? - Birê biçûk jê dipirse.

Birê mezin rûdinî, çi ku hatîye serî şirovedike, çewa ku qewimîbû.

- Tişt nabe, - birê biçûk dibêje, - derd nekşîne, tu malda bimîne, naha jî ezê herim.

Radibe îjar jî birê biçûk diçe dîsa cem wî dewletî, dibe xulam.

Dewletî dîsa wede kivş dike, hetanî biharê dengê pûpûyê bê û qîrar datîne, ku herkê xulam hêrs be, hezar manat cirm bide, yanê jî deh sal bêheq bixebite, yan jî heqê xwe her çi be, hezar manat bide û ji wê rojê şûndatir xulam aza be.

- Na, ew hindike, axa, - miqabil disekine,

-herkê tu hêrs bî, tu du hezar manat bidî min,

8

herkê ez hêrs bim, ez du hazar manat bidim te, yan jî bîst sal bêheq bixebitim.

- Bira usa be, - dewletî şa dibe. Qîrar girêdide û naha jî birê biçûk dixebite. Sibe safî dibe, ev xulam ji cî ranabe. Xweyî derdikeve devra û tê mal, lê xulam hela razaye.

- Oro, de rabe, ro bû nîvro.

9

- Hi tu hêrs dibî? -Xulam serê xwe bilind dike.

- Na, na, ez hêrs nabim, - bi tirs xweyî cabê dide, - yenê ez dibêjim, gerekê tu herî zevîyê biçinî.

- Erê, wekî tu usa dibêjî zîrar nake, ezê herim, çima lez dikevî.

Xulese, xulam radibe, destpê dike çarixê xwe dike pê. Xweyî diçe derva, tê hundir, ew hela çarixê xwe dike pê.

- Kuro, de zû bike, pê ke.

- Hi, tu hêrs nebe.

- Wa, kî hêrs dibe? Min tenê dixast bigota,  
em dereng dikevin.

- Erê, ew tişteki başqeye, yanê na qirara me qirare.

- Hetanî xulam çarixê xwe pê dike, hetanî diçe zevîyê, ro dibe nîvro.

- Diha çi wextê çinînêye, - xulam dibêje, - tu dibînî gişk xwerinê duxun,  
em jî xwerina xwe buxun, paşê.

Radibin, xwerinê duxun. Ji xwerinê şûnda dibêje:

- Ê, em merîne rencberin, gerek hinekî em razên, rehet bin, yanê na? -  
Serê xwe dike nav gîhê û hetanî êvarê radizê.

10

- Oro, rabe, ev bû tarî, xelqê çinîn, zevîya me ma ... Way, kê ku tu şandî,  
stîyê wî bişkê, way xwerina te jî heram be, kirina te jî. Ez ketim nav çi  
agirî? - Xweyî guman lê birî dest bi qajeqajê dike.

- Erê, -dibê, - tu hêrs dibî? - Xulam serê xwe dike binî.

- Na kî hêrs dibe? Min wê digot, wekî terîye, wextê çûyîna malêye.

11

- Erê, ew tişteki başqeye, em herin, yanê na, tu qirara me zanî, guneh  
stîyê wî be, kî ku hêrs be.

Têne mal, dibînin ku mêvan hatîye. Xulam  
dişînin ku here pez şerjê ke. - Kîjanê?

- Kîjan ku rast tê!

Xulam diçe. Lezekî şûnda cawê tînin dewletîra, ku xwe bigihîne, xulamê  
te kerîyê te tamam şerjêkir. Eva dewletî dibeze, dibîne raste, ku çiqas  
pezê wî heye, xulam gişk jî şerjêkirîye. Li serê xwe dixê, dike qîrîn.

- Eva te çi kirîye, bêxwedê, mala te xrab be, çima te mala min xirab kir.

- Te got kîjan pez rastî te bê şerjê ke, ez jî hatim, gişk rastî min hatin, min jî gişk şerjê kir, tiştê dinê, zêde kêr, min çi kirye? - Xulam bi rehetî caba wî dide. Lê ez texmîn dikim, ku tu hêrs dibî?

- Wa, ez hêrs nabim, tenê heyfa min tê, ku aqas malê min pûç bû ...

- Pak, ku hêrs nabî, dîsa ezê qulix kim. Dewletî duşurmîş dibe, çi bike, çawa bike, wekî ji ewî xulamî aza be. Qirar grêdaye hetanî

12

bihara dinê, ku bangê pûpû bê, lê ew ku teze ketine zivistanê, lê hela bihar û pûpû kêderêne.

Difikire, difikire, çarekê dibîne. Jina xwe dibe mêşe, radike ser darekî û temînê dide, ku mîna pûpû bike gazî.

Xwe jî tê cem xulam dibêje, were em herin mêşe nêçîrê. Çewa ku diçine mêşe, jin ji ser darê gazî dike - "Pûpû, pûpû"

- Erê, çevê te ronî, - xweyî xulamê xwera dibeje, - pûpû gazî kir, wedê te kuta bû ...

Kurik jî fêlê xweyî fem dike.

- Na, - dibêje, kê bihîstye salê wedê nahada, nîvê salê pûpû gazî bike? Ez gerekê ewî pûpûyî bikujim. Eva çi pûpûye? - Dibêje û tvinga xwe ber bi darê rast dike.

Xweyî dike qîrîn, xwe davêje ser lingê xulamê xwe.

- Way, tu lînexe, Xwedê hiz bikî ... Reş be roja ku tu rastî min hatî, eva çi qezya bû, ku ez ketime.

- Erê, dibê ku hêrs dibî. .. ?

- Erê, bira, bese, were çi cirme, ezê bidim, were bidim, ji te xlasbim.

Qirar danîna mine, ez jî gerek cirmê bikî-

13

nim. Naha teze fem dikim, ew pirsâ kevn, ku "Merî çî bike, wê sere xwe bike". Dewletî wa milûk dibe, lê birê biçûk kaxazê birê mezin diqelişîne, hezar manatî jî cirmê hiltîne, vedigere tê mala xwe.

14

Biçûk: biçûk, hûrik, ne mezin, ne gir

Çûk: biçûk

Derva: derve, der, xaric, ne hindirr, ne tê de, ne tê ve.

Dewletî: fermî, resmî, îdarî, mîrî, hikûmî, tişta/ê bi birryara dewletê tê kirin

Duşurmîş: ...

Gişk: gişk, giştî, hemî, hemû

Hêrs: qehirî, enirrî, xezebî, har, hêç

Hundir: hendirûn, hindirr, tê ve, tê de, daxil, ne derve, ne der, ne xaric

Kengê: çî demê, çî çaxî, çî wextî, çî gavê

Kivş: kifş, diyar, berçav, xuya, eşkere

Kurik: kurrik, zarokên nêr, kurrên biçûk

Qayîlî: rizamendî, razîtî, qanetî, razîbûn, qayilbûn, qanebûn, qebûlkirin

Qîrîn: qîrrîn, bi dengê bilind gazî kirin yan girîn, bankirin, bilind xicakirin

Şûndatir: pişûnda

Usa: were, wereyî, wisan, bi wî awayî, bi wî şêweyî, bi wî şiklî, bi wî rengî

Xebat: ked, kar, çalakî, kiryar

Zevî: erd, zemîn, telan, erdê çandinê,

\*\*

Wien - 2012

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 10

Xinko Aper

ZAROKÊN NEXWESTÎ

ISBN-13: 978-975-05-1680-1



1. BASKI 2014, İstanbul

KAPAK Suat Aysu

KAPAK FOTOĞRAFI Faruk Ayyıldız

BASKI ve CİLT Sena Ofset · SERTİFİKA NO. 12064

e-mail: iletisim@iletisim.com.tr • web: www.iletisim.com.tr

Zarokên Nexwestî

Xebata Bibîranîn û

Bibîrxistina Komkujiya

Roboskî

Rohat için...

Ji bo Rohat...

İçindekiler

8

9

Destpêk

Çi tê bîra me? Çawa tê bîra me? Yan jî em çawa ji bîr dikin?  
Ma bi rastî em ji bîr dikin? Kêliyeke biçûk, piştî bi salan çawa  
derdikeve pêşiya me? Yan jî peyvek... An jî bêhnek, dengek,  
cihek, renek... Çi tîne bîra me û çima tîne bîra me? Hişê me;  
bi qodkirinên diyar, bi nîşaneyan çi bi cih dike di hişê me de?  
Hişê me ji çi ava dibe? Çi di hewîne, çi vedişêre û bincil dike,  
çi li ser ruyê erdê dihêle?

Pirs dirêj dibin û diçin. Xebatên hişî-hafizeyî û lîteratûra li  
ser vê tê pêşxistin; hin bersivan dide me. Bibîranîn, jibîrkirin,  
bibîrxistin, hafize, qodkirin, nîşane û hiş ji çi ava dibin, li ser  
vê yekê ji feylesofên yekemîn heta zanyarên civakî yên îro, bi  
berfirehî nîqaş hatine kirin. Di vê mijarê de yek ji çavkaniyên  
herî baş ya Ricoeur, nîqaşên Platon û Protarkhos vedibêje. Di

vê nîqaşê de Platon giyanê dişibîne pirtûkekê û wiha dibêje,  
“Dema hiş û îdraq rastî hev tîn, ramanên ji vê hevdîtîna ava  
dibin wek ku li ser giyanên me hin peyvên dinivîsin; dema fikirîneke  
wisa tiştên rast dinivîse, di dilê me de baweriyeye rast  
û peyvên rast ava dibin. Lê ger ku nivîskarê di hindurê me de  
tiştên çewt binivîse, wê çaxê encam dê berovajî heqîqetê be.”

10

11

Aha armanca vê pirtûka di destê we de ev e ku bibe pirtû-  
keke rastiyê dinivîse. Helbet; bi vî awayî di hewldana ghiştina  
heqîqetê de ye.

Dîrok; bi dokumenan hewl dide kronolojiya xwe ava bike.  
Lê belê, ger ku ev dokumen hatibin guhertin, veşartin, berovajîkirin,  
dîroka me ya fermî dê ji dîrokê bêhtir bi nîjadperestî  
û gelek caran bi mîlîtarîzmê tijî bibe. Li aliyê din, rêbazên  
zanistî yên wekî antropolojî û sosyolojî ku lingekî wan li qadê  
ye dikarin dîrokekê derxin holê û bigihînin heqîqetê. Ev  
pirtûk, bila bi nivîsê bibe wesîleya ghiştina heqîqetê. Yanî ne  
fermî, ne jî bi nîjadperestî û mîlîtarîzmê, tenê bila heqîqetê  
pêşkêş bike. Da ku; hişê me bi peyvên layiqî mirov û mirovahiyê  
bêne xemilandin.

Hetanî îro me bi peyvên xemilandî raboriya xwe, dîroka  
xwe, tiştên di hişê xwe de venegotin. Niha di vê xalê de, divê  
em dîsa pirsê “em çî, çawa bibîrtînin” bikin. Ricoeur dibêje,  
“Bîranîneke biçûk wekî îdraqekê tê, lê belê bibîranîn lê-  
gerîneke aktîf e”. Yanî balê dikişîne ser ku bibîrxistînek rastî  
hişekî veşartî nayê. Dîtina wî ew e ku bibîranîn bi lêgerînekê  
re, helwesteke bi zanebûn e. Çi qas wext di ser re derbas bibe

jî tiştê ku tê bîra mirov, qîmeta bandora li ser me û dîroka me derdixe holê. Û ev bibîranîn balê dikişîne ser wateya jiyan, mirov û civakê.

Heta ku mirov bi bîr neyne, ji bo bibîranînê lênegere; li holê ye ku cîhaneke çawa tê afirandin. Bi bibîranînên me, hêza me ya ku têra gelek tiştan dike jî... Bi tevahî bêyî qalkirina van, bêyî hatina ser vê mijarê, vê pirtûkê xwest hêza bibîranîna hevpar û hişê hevpar nîşan bide. Tiştên tîn jiyîn, şexs şexs jiyanên me di civakê de teqabûlî çî tîn, nîşan bide!

Ji ber ku; “Hewldana bibîranînê, bi awayekî berfireh hewldaneke diyarkirina dîrokê ye”. Tenê û tenê nejbîrkin, lêgerîn, hewldan bi xwe jî çî qas li me baş tê pêwîst e em bibînin. Qesta me ne ew e ku her roj, her saniye em bi wê bijîn,

12

13

razên û rabin wê bifikirin: Tenê hişekî çalak, hafizeyeke çalak! Hişekî ku me xurt dike, destê me xurt dike, hevpar dike û pêşerojê diyar dike...

Ev xebat; ji ber vê yekê wek hewldaneke bibîranînê hatiye amadekirin. Dema ku nû derket holê, ji xema bibîranîn û hevdîtina bi Roboskî re bû. Di vê navberê de; me xwest wergerînin ‘lêgerîneke çalak’. Ji ber ku me careke din ferq kir ku tenê di nêrîna dîroka me ya nêzîk de, bê çî qas tişt hene ku em li hev civandine!

Bi vê danehevê divê me gaveke hevpar biavêta.

Bi pênuşê!

Di 28’ê Berfanbara 2011’an de, balafirên şer yên Tirkiyeyê, li Şirnex/Qilebanê li ser noçteya sifir a sînora gundê

Roboskî (Ortasu) û Becuhê (Gülyazı), 34 gundiyên  
çûbûn qaçaxê bi qantirên wan ve bombebaran kirin û kuş-  
tin. Bûyereke ku hevokek têrê nake; bûyereke ku nakeve  
dîroka mirovahiyê, bûyereke bi tu peyvan nikare were ziman...  
Lê me anî ziman û di hevokekê de bi cih kir! Me  
hemûyan nivîsên bi bandor û gelek balkêş nivîsîn. Me ji  
mirovên ku nizanin re vegot. Me nîşeyek li dîrokê nivîsî.  
Û bû sibe!

Bû sibe û eynî wek Sêwas '92, 12 Îlon 1980, Rêbendan,  
Îlon, dem û kêlî derbas bûn.

Gelo di 29'ê Berfanbara 2011'an de çî bûbû? 30'yê Berfanbarê,  
piştre û piştre... Em ê çawa Roboskî bi bîr bînin? Bi  
dayikên ku hêviya wan ji hêza edaletê, hêza civakî nemaye û  
destê xwe ber bi Xwedayê jor ve bilind dîkin? Bi dayik, bav û  
zarokên digirîn? Bi dîmênên tabûtên ku rêz bi rêz, li bal hev  
hatine dirêj kirin?

Em komkujiyên berî vê çawa bi bîr tînin? Bi hêsirên çavan,  
êş, têkçûn, perçiqandin, tarîti, "xweş lê bi êş" ... Hafizeya ku  
dewrî me hatiyekirin, tevî ku ne serpêhatiya me ye, îro jî me  
diêşîne. Li Sêwasê dişewite, bi rojnamegerên hatine kuştin re

14

15

parçe parçe dibe, ji ber 12'ê Îlonê di qirika me de girêk, ji ber  
nasname, ziman û olê her tim cudakarî, cudakarî...

Gelo em nikarin bi awayekî din bi bîr bînin? Mînak, bi  
kenîne! Bi lêpîrsîne! Bi yekîtiye!

Komkujîya Roboskî; di nav vî şerê 30 salî de, anîna girseyan,  
mirovan, dayikan a bal hev, taa ji dûr kişandina wan a

gundekî li serê çiyayê Xwedê, di heman demê de tişteke yekemîn bû. Di komkujîyeke li dijî nasnameya kurdan ku li Tirkiyeyê hate jiyîn de, cara yekemîn girseyeke ewqas berfireh hate bal hev. Erê; ev sersaxiyek bû, lê di heman demê de piştevaniyek bû jî! Di nav sersaxiyê de piştevaniyek! Em vê derxin pêş? Yanî êşên xwe, komkujîyên xwe, janên xwe bi piştevaniyê, bi yekîtiyê, bi hêza hevpar bi bîr bînin? Hwd hwd...

Vê xebatê bi vê xeyalê dest pê kir!

Di destpêkê de, bi hevalên Şirnexî û Amedî re plan hatine çêkirin. Plana pêşî ya vê xebatê bi vî awayî derket holê. Nivîsandina çîrokên Roboskî bi nivîskaran, wênesazan, rojnamegeran. Heta îro li ser Roboskî gelek nivîs di rojnameyan de hatin nivîsîn, lê di çarçoveya pevxistinekê de carek din û carek din nivîsandin. Nîşe girtin. Bibîranîn. Nedan jibîrkirin. Piştî em bi çend ciwanên Roboskî şêwirîn. Di dema mihrîcana Şirnexê de, ciwanên em bûne mêvanê konê wan ji me re gotin:

“Hûn gelek baş fikirîne. Roboskî çiqas bê vegotin, çiqas di rojevê de bê hiştin ewqasî baş e! Li gorî min mesela divê nivîskarên wek Dostoyevskî, wek Tolstoy hebin di nav de...”

Êşa wan ewqas mezin bû, tenê nivîskarên di qada navneteweyî de ‘ewqas mezin’ dikarîn vebêjin. Tenê wê dikarî dilê wan rihet bike. Serboriyên wan, tenê ew dikarin îfade bikin! Jixwe, ji ber ku em nikarin wan ji gorê derxin û hevdîtinan bi wan re bikin; em çûne cem kesên cuda, gotinên ciwanên Roboskî di guhê me de...

Navnîşan Stenbol bû. Navên em çûne cem wan, navên dijberî nasnameyên qaçaxçî, xizan ên kurdên ku hatibûn kuştin; navên tirk, dewlemend û ji pîşeyên rêzdar bûn.

Pirahiya hevdîtinan; li ser bingeha ku çep, sosyalîst û tevgerên kurd ên li Tirkiyeyê bikaribin têkiliyên xwe yên bi koma “rewşenbîr”an re di ber çavan re derbas bikin, hatin kirin!

Lê ev nîqaşeke din e. Dîsa jî ji bo em vê nîqaşê jî nîşe bigirin em anekdotekê ragihînin. Hevdîtina me ya yekemîn a ji bo pirtûkê bi nivîskarekî me yê “mezin” re çêbû, bi husran! Piştî hevdîtinê hevalê min ê xebatê, ji Şirnexê li min geriya û got: “Dev jê berde, were vir û bi zarokan bide nivîsandin, ew ê baştir binivîsin. Mineta kesî li xwe neke”. Ev gotin bû sedema derketina vê pirtûkê. Piştî gelek hevdîtinên me yên ku encama wan pir ‘xerabtir’ jî çêbûn, lê dîsa jî sirf ji bo hêvî ‘ji vir’ qut nebe, weke înad ev pirtûk derket...

Piştî hevdîtinên çar mehan, bi rewşenbîr, hunermend û mirovên ‘hîs dikin’ re, me komeke hevpar ava kir, ji bo ku em Roboskî careke din bibîrbînin.

Bi çîroka qoricitiya bajarokekî li ser sînor, Goyîtî, bi bazirganiya navneteweyî ya sînor re rastî ku derê tê, dest pê kir. Piştî, me roja komkujiya ku ev pergala damezrandî carek din hejand vegot. Dûre jî jiyanên yek bi yek hatin guhertin! Bi hesta edaletê, bi neçariya hekîman, bi xeyalên qîzên ciwan, kesên birîndar filitîn, rêbazên xwe dermankirinê, temaşekerên ji televîzyonê, yên digirîn, yên dikenîn re, jiyanên hatin guhertin.

Piştî me ferq kir ku; ev jiyan, jiyanên me bûn ku paşê hatin guhertin! Tişta hate bîra me, ne tenê Roboskî bû! Nivîskaran

hemûyan, çîrokên jiyana xwe bi xwe bibîranîn! Televîzyonên ku bûyera Roboskî demeke dirêj nexistin nûçe, ji xwe me ew di şikestinên berê yên ku di medyayê de pêk dihatin de dîtibûn. Paşê awayê pêşkêşkirina nûçeyan ji hêla girseyên ku televîzyonan dişopînin ve çawa hate pêşwazîkirin jî, di siyaseta me ya rojane de hîn em dibînin. Pîlotên balafirên

18

19

ku komkujî pêkanîn, her yek “di bin emir de”, ew mijareke ne gelek xerîb e ji bo me, mûhasebeya wan a wijdanê ya paşê jî... Dema em bi zarokên ku bavên wan hatine kuştin re diaxivîn, em bi rastiya ku çiqas bavên me hatine kuştin re jî rû bi rû man ji xeynê demên salvegera kuştin wan... Û herî zêde serhildêriya jinan li me xuyan bû. Piştî çûna bav û mêran ew sekna serbilind! Zor û sekna serbilind! Ji bo em bikarin li cem vê sekna serbilind bisekinin hewce bû ku em bikevin heta xewnên wan, û em bûne mêvanê xewnên wan.

Roboskî bi înad, herî zêde jî bi navê kenîne, bi şîara meşîna hevpar; me ewqas hewl da ku em bûn gelek ‘zarokên nexwestî’. Ji gotina serokwezîr a “Her Kurtaj Qilebanek e” re bersiva jinan:

“Ê wê çaxê dewletê, li Qilebanê zarokên xwe yên nexwestî kuştin?”

Pergal, belkî cara yekemîne di vê pêvajoyê de, bi awayekî ev qasî hişk, kesên “sade” tenê ji bo gotinekê dikare “nexwestî” îlan bike. Di çalakiyên Geziyê de, êdî kesên li kolanan hedef dihatin girtin, bi taybetî ji bedela kesên li pêş, kesên pêşeng, me dît ku “hema yek ji wan” yên li kolanê ji xwe re dikir

hedef. Ji vê bêhtir, pergal “êdî” dikare ji ber peyvekê, ji ber seknekê her kesî nexwestî îlan bike, wek rojnamegerê nexwestî, nivîskarê nexwestî, parêzerê nexwestî, siyasetmedarê nexwestî... Tahamulî yek peyvê, rexneyê, nayê, li dij derketinê, nake.

Navê pirtûka me jî ji vir tê. Ji bo ku wekî yekî ku komkujî kiriye, di ser de jî bi qasî ku bikare bişibîne kurtajê quretiyê bike, em miheqeq zarokên nexwestî ne!

Û gotina dawî; ya zarokekî ye. Zarokekî ji Roboskî. Zarokekî berî bûyerê dixwest bibe seyah, piştî bûyerê jî dixwaze bibe rojnameger-nivîskar!

Ji me re pêşeroj nivîsî vî zarokê xweşik...

\* \* \*

20

21

Min xeyalek çêkir ji xwe re. Bi jinan dest pê dike, bi zarokan xelas dibe, bi mirovên baş û tijî bîranînên bi hêvî! Tevî ku em dixwazin cîhanê biguherînin, min xwest em ji cîhanên me dest pê bikin. Û min xwest “pêşî ji êş û janan dest pê bikim”, “berî ku em hînî êşê bibin”.

Piraniya nivîskaran dê li we nas bîn, paşnavên wan û paşê vegotinên wan, hestên wan, fikrên wan, dilîniyên wan... ji ber ku dê tiştinan bînin bala me! Roja bavên wan hatin kuştin em li ku bûn dê pêşî ev were bîra me, paşê çalakiyên me yên ji bo wan belkî... û tu bixwazî nexwazî kederek, tarîtiyek dê bikeve dilê me! Min xwest tişteki din deynim cihê wê tariyê, me xwest! Tev bi hev re! Bi awayekî cuda bi bîr bînin.

Wek şexs jî ev xebat ji bo min gelek tiştan îfade dike. “Tu



tiştên xweş bi bîr tînî” dibêjin zarok ji bo min... min xwest em tev bi hev re tiştên xweş bi bîr binin. Lê ger ku min tiştên xweş bi bîr neanîba min qet nikaribû vê bikim. Dema min li çiyayê Cudî dinêrî, dema li Hasret Gultekin guhdarî dikir, dema li ser Roboskî dinivîsî... Tevî hemû tiştan jî min xwest em tiştên xweş binivîsîn.

Ji bo siberojê...

Ji bo zarokan... Herî zêde jî ji bo Rohat...

Ez spasiya wan kesên dikim ku di vê pêvajoyê de li cem min sekinîn, tevî li hember derketina rêbaza vê xebatê dîsa jî piştgiriya xwe jê kêr nekirin, di demên zor yêrî de xebatê de hemû hevalên ku zehmetiya min kişandin, mamosteyên min, rêhevalên min... Kesên dema ku bixwînin û rûyê wan bikene, yêrî ku min navê wan neanî ziman û ew mirovên ku ew spasî heq dikirin!

Ez hêvîdar im, wê rûyê her xwendevanê ku vê pirtûkê bixwîne -hêsirên çavên wan neseke jî- wê rûyê wan bi ken be!

Digel her tiştî!

Xwendevanê hêja:

Digel her tiştî, dîsa jî bikene!

22

23

Çi bû Roboskî?

NEŞE ÖZGEN

Roboskî! Ez jî tu me! Ne ji te! Ne li rex te, ne li paş te, ne li pêş te me! Ez jî tu me!

Ez Roboskî...

Gundek ku niha navê wî bi mirin û xizaniyê tê bibîranîn!

Ma wisa bû? Roboskî; Berî ku bi mirin û êşên xwe were naskirin, bi govend, hingiv, çiyayên xwe yên bi heybet û xweşik, zozan û çêreyên xwe yên bilind, însanên xwe yên jêhatî, belkî bi pevçûnên xwe yên biçûk ên navxweyî; lê wekî her gundî û wekî her gundekî têra xwe dikir, di warê şefafbûn û nirxên însanî de gundekî ku bi xizaniyê nikare were pîvan bû. Gundekî, bi guzên xwe yên xweşik, bi pereyên ku ji bazirganiya derveyî sînor qezenc dikir, bi xeyalên zarokên xwe yên ji bo kar dişandin derve, bi kêfxweşiya zarokên ku nû jidayik dibûn barkirî bû. Ne xizan bû. Xizanî; rewşek e ku bi dûrahiya di navbera me û kesên din de tê terîf kirin. Dema ku em wisa lê dinêrin dibe meseleya mûhendîsiya civakî. Em ne xwedî wê kapasîteyê ne û ne hedê me ye ku em cihekî bi xizaniyê terîf bikin. Ji ber wê

24

25

yekê Roboskî ne xizan e. Qet ne xelkek wisa ye ku ji ber xizaniyê qaçaxiyê dike.

Ne xizanî û ne kurdayetî; em hinekî jî ji sînor binêrin! Gelek tiştên em bi sînor fahm bikin hene. Sînor, yanî, hestên di nav cihekî ku di navbera du welatan de asê mane çi ne? Gelo hemwelatîbûna sînor, ji hemwelatîbûna herêma hundirîn cûdatir e? Têkiliya wan bi dewletê re hîn cûdatir e?

Gelek lêkolîner, di destpêka lîteratûra sînor de wiha dibêjin:

“Di herêmeke sînor de, hemû tiştên di welatekî de diqewimin, di ser de jî li wan deran tiştinên din jî dibin.”

Belkî jî hevoka sînor herî baş tarîf dike ev e. Ji ber ku carinan eşkere, carinan veşarî, carinan bi şid ji hev veqetandî, carinan

di navbera wan de herêmên derbasbûnê, carinan herêmên sî-  
nor yên şûna wan ne diyar; a rast hemû dîrok, hiş û barê avakirina  
welêt ew hildigirin. Lê her herêmeke sînor aliyên xwe  
yên taybet hene. Roboskî û sînor jî xwedyên wan taybetmendiyan  
in...

Li Tirkîyeyê sînorek li gorî sînorekî din nehatiye têl kirin.  
Mînak, Enez a li Trakyayê, yek ji sînorê herî asê yê Tirkîyeyê  
ye. Ji 1972'yan heta 2004'an, tevahiya navçê wek herê-  
ma qedexe hatibû diyarkirin. Ne ku yekî biyanî dikarî ji wir  
milk bikire, hemwelatîyên Tirkîyeyê yên ku niştecihiya wan  
li hundir tunebûya jî ketina wan a vê navçeyê girêdayî destûrê  
bû.

Wekî din; Sînorê Merîç-Ispalayê heta sînorê Derekoy  
Varnayê aliyê jor, di demên herî giran yê şerê sar de jî vekirî  
bû. Di sala 1930'yî de Komara Tirkîyeyê, tirkên li Bulgaristanê  
ji dayik bûbûn revandine vî alî, derbasbûneke berovajî  
çêbûye. Paşê ji salên 70'yî û pê de bûye herêma derbasbû-  
na herî zêde ya çepgirên Tirkîyeyê. Piştî 80'yî jî qaçaxên siyasî,  
piştî 90'î bûye sînorê derbasgeha penaberên ji ber xizanî  
û şerên heyî. Hetanî Yekîtiya Ewropayê... Ji kêliya ku  
Yekîtiya Ewropayê dest bi avakirina keleha xwe ya derve kir,

26

27

sînorê Merîçê bû sînorê me yê herî asê. Niha li cîhanê ji serdema  
navîn û vir ve Frontex kesên ji sînor derbas dibin dikuje  
yan jî wan terkî mirinê dike, têlên bi elektrîk dikişîne,  
kamerayan bi cih dike.

Sînorên dewletên ku em li hev nakin, Îran û Ermenistanê

jî niha gelek serbest in. Dema em bi dewleta hember re li hev nakin, em dibêjin qey sînor bilindtir dibin; berovajî wê sînorê Îran û Ermanistanê pir sist in. Li sînorê Îranê mayîn pir kêr in, 'Baldaî! Qada bi mayîn' dinivîsîn jin ji bo ku di derbasbûnê de tu pisgirêk dernekeve.

Ji Sovyeta kevn sînorên Gurcistan-Azerbaycan-Ermenistanê berê sînorên di navbera NATO û Sovyetê bûn, loma jî pir asê bûn. Lê ji van sînoran ê herî asê, li Rojhilatê Bakur sînorê gundê Sarpi bû. Û yê din jî sînorê Enezê bû. Li van her du milan pergala li dij hev in, ne dewlet. Li sînorê Qafqas di dîrokê de çîrokên gelek bi êş hene, lê niha sînorekî pir sist e. Ji xwe, ji bo çûna Hopayê ewil derbasî Batumê dibûn û paşê derbasî vir dibûn. Batum ji Trabzonê nêzîktirî Hopayê ye. Em dakevin Başur: Sînorê Yayladagê heta Serêkaniyê, milê Tirkîyeyê ji hêla eşîrên tirkmen yê wê dawiyê li ser wê deşta bi bereket hatin bi cîh kirin ve tê parastin. Destûra qaçaxçîtiyê didin van koman. Sînorên wir pir nenas e. Ji dema ku Hatay tevî Komara Tirkîyeyê hatiye kirin ve sînor li xelkê wir hatiye girtin. Em werin ser sînorê Iraq û Tirkîyeyê: Ji Şenyurtê heta Silopî-Verimli'yê, piştî 52'yan bi têlan hatiye ristîn, heta 70'yî tenê bi têlan hatiye îdare kirin, piştî 70'yî qûlûbeyên nobetdaran hatine danîn. Mayîn danîna herî zêde û rewşa dubare dubare têl kirinê jî di cuntaya faşîst ya 80'yî de hatiye jiyîn. Ecêb e ku mayîn û têl çiqas zêde dibin, qîmet û îlegalîteya malê qaçax a di sînor re derbas dibe ewqas zêde bûye. Berê malê bazirganiyê derbas dibû, lê di dema cûntaya faşîst a 1980'yî tevî male qaçax, alavên wek çekên giran û tilyak, li ser zêde bûye.

28

29

Sînorê Culemergê yê ku Roboskî jî digire nav xwe, ango ji paralela 36'emîn û wir ve; bi awayekî ecêb, ne têt, ne jî mayîn hatine ristin. Ji çiyên ber bi çiya, heta bi jor sînorekî kerterîz hatiye girtin.

Li sînorên Tirkiyeyê, têt, mayîn, derî wisan in! Sînorên di nava demê de, têne guhertin, asêkirin an jî têne sist kirin.

Polîtîkayên têne sistkirin... Navên têne guhertin...

Sînor di nava demê dihatin guhertin; Nêrîna Komara Tirkiyeyê a li hember xelkê sînor û derveyî sînor, qet nehate guhertin.

Lê mixabin vê dewletê, mixabin vî welatî ji destpêkê

ve, dev ji wê dîtina wekî hemû herêmên sînor, xelkên sînor dijmin û dijberên pergalê ne berneda. Dev ji wê dîtina wekî hemû herêmên sînor hewzeke etnîk ya dijminên dewletê ne berneda. Hemû herêmên sînor, wek ku amade ne bi derveyî sînor re hevkarîyê bikin, wek dijminê potansiyel bi nav kir tim. Dewlet, rejîm, aborî, di nav salan de geherîn. Welatên cîran ên ji destpêka avakirina komara Tirkiyeyê û heta niha hene hindik man. Rejîmek nema. Navê welatan guherî.

Nêrînen wan guherî. Binyada wan guherî. Xeyalên wan guherîn.

Lê dîtina komara Tirkiyeyê ya hemû cîranên xwe wek

dijmin dibîne neguherî. Û nêrîna wê ya însanên xwe yê li kêleka sînor dijîn, wek kesên bi dijmin re hevkarîyê dikin neguherî.

Rewşa giştî ev e. Ev yek dem bi dem zêde dibe û dem bi dem kêma dibe, lê ev dijminahî tim wek xwe dimîne.

Însanên li herêma sînor; li hember vê nêzîkbûna dijminahî

û bersiva vê jiyana rojane ya bi dijminahiyê hatiye dorpeçkirin,

carinan ji vê sûd wergirtin, carinan ber xwe dan, carinan xwe îzole kirin, carinan jî dev ji berxwedan û yên din hemûyan berdan û çare di reva ji welatê xwe de dîtin. Bersiv bûn ev. Di demên cûda de, bersivên cûda...

Esasen herêmên sînor, hem li gorî têtikiliya têtighan ya wî welatî û welatê hember, hem jî li gorî polîtîkayên wan dirûv digire. Carinan sînor, li gorî welatê hember dijmin an ne dij-

30

31

min e, di carekî de dikare hişk an jî sist bibe. Carinan li gorî rewşa hestên bûrokratên herêmî û yên sînor diparêzin jî têtikiliyên her du welatan dikare tesîr lê bike. Lê sînorek, teqez ne du parçeyên xirab bi hev ve hatine kirin e, di navbera du welatên kokdar yên li hember hev de.

Carinan sînor dikarin hewzeke etnîk bihewînin. Carinan komên etnîk yên li her du aliyan hatine bicîhkirin, ji netewa etnîk ya totalîter ya wî welatî cûda ne. Carinan tevî ku ji netewên bingehîn yên her du welatan cûda ne, dikarin xerîbê hev bi xwe bin jî. Li Tirkiyeyê ev yek zêde tê dîtin. Lewma em nikarin bifikirin ku hemû sînorên netew-dewlet pê hatine çêkirin wekî xetên di nava têtikiliyên beşer re bi bêxemî hatine derbasbûyîn in jî. Li ser rewşa resen ya her sînorî divê em dubare binirxînin. Tabî bêqutkirina ji rihên wê yên dîrokî...

Sînorê ku Roboskî jî di nav de ye xwedî dîrokek kevnar e.

Du welatên xwedî dîrokek kevnare, derveyî hewza xwe ya etnîk, herêma ku rastî hember Roboskî tê jî ne aîdî etnîka bingehîn ya wî welatî ye. Mehelîtiyeke cuda jî heye di aliyekî de.

Hişkê vê mehelîtiyê yê ku dewlemend dike yê ji hêla wan însanan ve nîşandayî, mezinkirê heye. Divê mirov bi vî awayî jî li Roboskî binêre. Ev hiş bi dangan, stranan, govendan, stranbêjan, bi qalibên jiyana rojane hatine mezinkirin. Xelkê Roboskî dizane bê ew bi xwe 'çî' ne. Dizane çî li welatê wan û welatê hember dibe. Lewma dema ku em li ser Roboskî diaxivin, bilêvkirina hêmayên wekî "gundekî dût û bi tena serê xwe, ji xizaniyê li ber xwe dide û ji xeynê qaçaxê tu rê jê re hatiye hiştin' heqareteke mezin e. Aqil, hest û dewlemendiya dîrokî ya însanan ger ku ji hêla sîstema kapîtalîst û dewletê ve evqas nehatiba xizankirin û mehkûmî îllegalîteyê nehatiba kirin, dewlemendiyan wan yên mezin ku têra wan dikin jî hene.

Tevî dewlemendiyan xwe yên mezin, vî gundî zilmeke me-

32

33

zin jî dîtiye. Di heman demê de Roboskî bi xwe jî gundeke ku hatiye vala kirinê.

Leşker, li sînora herêmekê vala dikin û peyre qaçaxçîtiyê wekî lutfekê pêşkêş dikin; dîrokeke vê ya dirêj, êş û hafizeyek jî heye di vê mijarê de.

Dîrokeke Qilabanê ya gelek berî salên 90'î heye. Dîrokeke ji dema Mele Mistefa Berzanî mayî heye. Jixwe xelkên vî gundî, piştgirên herî mezin yên tevgera Berzanî ya ku nû mezindibû ne. Paşê, Komara Tirkiyeyê diyar an nediyar be jî, em dibînin ku di aliyekê de hem diçewisîne, hem jî rûşwetê dide vê koma herêmî ya li vir. Li aliyekê, ji hêla Nisêbînê heta Serêkaniyê bi têlên qat qat û mayînan datîne. Di salên 80'yî

de, wekî ruşwetekê ev sînor gelek nehatiye asê kirin û stûr kirin, em dibînin ku li hember çûn û hatinê dîwar û bend nehatine danîn.

Esasen, îro Roboskî merhaleyê nû ye. Ev qirkirin ne bû-yereke bi tesadûfî û bûyereke bê serûbin û di valahiyê de mayî ye. Divê em bibînin ku hem di nav sînorên mezintir yê Tirkîyeyê de, hem jî li gorî plan, proje û xwestekên dewletê yê der barê wî sînorê de ye.

Xelkê Roboskî însanên sînor in. Bi dîrok, hiş û barê xwe di şiverêyan re derbas dibin, di nava çiyayan re. Bi rastî, komeke taybet e xwedî hişekî ji hafizeya netewa xwe ya bingehîn jî cuda ye.

Nêrîna wan; ber bi erdnîgariya wan a polîtîk ve ye. Li cihê ku berê xwe didinê, texeyûleke erdnîgarî ya ku însanên din yê Tirkîyeyê fahm nakin heye. Nêrîna li erdnîgariya xwe ya însanên li derdora Culemêrgê ne bi ser rê û bajaran re ye. Tê-gihiştineke kevntir ya erdnîgariya polîtîk a hafizeya wan bi xwe avakirî ye, heye.

Nêzîkbûna Komara Tirkîyeyê ya li hemberî Culemêrgiyan dişibe nêzîkbûna polîtîk a Osmaniyan a li hemberî mîrên herêma sînor. Ne li hember Wanî û Amediyan, lê li hember

\*\*